

ROMAN

ROMANÊN KURDÎ

KURMANCÎ

Havîna 2017 an

1

**ROMAN**

Baskên Şkestî

Bilîcan

Bîra Qederê

Bîraninen Min

Birîna Reş

Biyani

Cîyayê Agîrî

Dara gozê

Dara Hinarê

Dê û Dêmarî

Derdê Gel

Dergûş

Dozexa sipî

Evîn û Şewat

Feqiyê Teyran

[Gardiyan](#)

[Hawara Dîcleyê](#)

[Hêvî her dem heye](#)

[Jana Gel](#)

[Keça Kapîtan](#)

[Keça kurd xanê](#)

[Kepez ê Xewna](#)

[Kurê zinarê serbilind](#)

[Labîrenta Cinan](#)

[Li Benda Godot](#)

[Li mala mîr celadet alî bedir-xan](#)

[Marê di tur de](#)

[Mehkûm](#)

[Memedê Zirav](#)

[Merivên Reben](#)

[Meryema](#)

[Mijabad](#)

wergerandin

Husein Muhammed

DIYARÎ:

ji bo wê

ya bi çavên bel li rojê dinere

û bi tiliyên cidî dest diavêje agir

û bîska bêmaddeyî ya Abadîniyê

ji pişt qîrînek bêpertav bideng fam dike

ji M.E.H re

vê pirtûkê diyarî dikim.

Cibran

PÊŞGOTIN

Ez hejdehsalî bûm dema ku evînê bi tîrêjên xwe yên

sihrî çavên min vekirin û yekem car bi tiliyên xwe

yên agirîn destê xwe gihand giyanê min, û Selma

Karamy jî yekem jin bû ya ku bi bedewiya xwe

giyanê min şiyar kir û ez birim nav bexçeyê hestên

berz ê ku roj lê mîna xewnan û şev jî mîna

zemawendan bûn.

Selma Karamy bi bedewiya xwe ez fêrî

ayîndarîkirina bedewiyê kirim û bi evîna xwe

nihînen evîndariyê nîşan min dan; ew yekem kes bû

ya ku ji min re li ser bedewiya jiyanê strî.



Di jiyana her mêrek xort de "Selma"yek heye ku derhal derdikeve bihara jiyana wî û, bi dagirtina şevên wî yê bêdengiyê bi muzîkê, tenêtiya wî lê dike bextiyarî.

Ez bi tamamî li ramîn û ponijînê kûr bûbûm û min dida xwe daku mebesta xwezayê û peyama pirtûk û nivîsên pîroz tê bigihim ta ku min bihîst ku evîn ji ser lêvên Selmayê dipiste guhê min. Jiyana min xewa giran bû, mîna ya Adem li Biheştê, bêwate bû dema min dît ku Selmaya mîna stûnek ronahiyê teyisdar li pêş min rawestî bû. Ew Hawaya dilê min bû ya ku dilê min bi nihîn û sosretiyên tijî dikir û wisan dikir ku mebesta jiyane fam bikim.

Hawaya pêşîn bi niyaza xwe Adem ji Biheştê da derxistin lê Selmayê bi bedewî û evîna xwe wisan kir ku ez bi dilxwazî bikevim nav biheşa qenciya pak a evîndariyê; lê, ya bi serê mêrê yekem hatî, bi serê min jî hat, û şûrê agirîn, ê ku Adem ji Biheştê derxist, mîna wî bû yê ku ez bi devikê xwe yê biriqdar tirsandim û ez mecbûr kirim ku ji biheşa evîndariya xwe birevim tevî ku ez li dij ti fermanan ranewestîbûm û min tam nekiribû fêkiyê dara qedexe jî.

Îro, piştî derbasbûna çend salan, êdî ji min re ti tiştêk ji wê xewna bedew nemaye ji bilî hin bîranînên bijan ên ku mîna baskên nebîn li dor min dipirin, kûratiyên dilê min bi xemgîniyê tijî dikin û rondikan

tînin çavên min; û evîndara min, Selma, miriye û ji bilî dilê min ê şkestî û gora wê ya darên selwî dorlêgirtî pêtir bîranînek ji min re nemaye.

Ne bêdengî, ya ku zêrevaniyê li gorê digire, nîşana nihînên Yezdan ên di tarîtiya tabûtê de diyar dike û ne jî xişîna çeqên daran nihînên gorê eşkere dike, ne çeqên wan daran ên ku hêza xwe ji cenazeyê dimêjin lê axînen nearam ên dilê min ji xelkê re ji wê şanoya trajedî, ya ku ji aliyê evîne, bedewiyê û mirinê de hatiye lîstin, dabaşê dikan.

Ax hevalên xortaniya min, ên ku hûn li Bêrûtê belav in, dema ku hûn di ber goristana li nêzî daristanoka darçaman re derbas dibin, bi bêdengî bikevin navê û bi seqbêrî û hişyar bigerin daku pêngavên we xewa miriyê neherimînin, û bi girametî li raserî gora Selmayê rabiwestin û erda ew hemêzandî

bisilavînin, û navê min bi axînen kûr bilêvînin û ji xwe re bibêjin: "Hemû hêviyên Cibran li vir hatine binerdandin, niha ew li pişt deryayên dûr dîlê evîne ye. Li vir wî bextewariya xwe ji dest da, her hêsira xwe werand û bişira xwe ji bîr kir."

Li vir xemgîniya Cibran bi darên selwî re mezin dibe, û her şev giyanê wî li hindav gorê difire, Selmayê bi bîr tîne, bi gazinên têrxem ên çeqên daran re dibe yek, axî û oxînan ji ber koçkirina Selmayê dikişîne, û Selma hê do jî bi şîrînî ji jiyana xwe dipeyivî lê îro ew êdî tenê nihînek bêdeng a

sînga erdê de ye.

Ey hogirên xortaniya min! Ez xwe dispêrim we û ji bo xatirê wan zeriyan, ên ku dilên we ketiniyê, destikên gulan dabinin ser gora evîndara min ji ber ku, yên ku hûn dabinin ser gora Selmayê, mîna wan çipên avê ne yên ku dikevin ser pelên sorgulên ji ber çavên roja berbanga spêdeyê hişkbûyî.

### XEMGÎNIYA BÊDENG

Hevalino, bi dilxweşî berbanga xortaniya we li bîra we ye û hûn diheyifînin ku ew derbas bûye; lê ew wisan tê bîra min ka çawa şifşe û zincîrên girtîgehê tînin bîra girtiyan. Hûn ji salên navbera zarokî û xortaniya xwe dipeyivin mîna ku ew serdemek zêrîn be ku ji sînortî û xeman azad e lê ez wan salan bi serdema xemgîniya bêdeng dinavînim ku ew mîna libek tov ket dilê min û tê de şên bû bê ku bikare jê derbikeve û rêya xwe ber bi cîhana awezmendî û zanînê de bibîne ta ku evîn hat û deriyên dil vekirin û ronahî da tarîşkeftên wî. Evînê bi peyv û rondikên xwe ez lerizandim. Hûn baxçe, orkîde û hevdîtingehan û kuçe û kolanan, ên ku lîstikên we tînin bîra we, bi bîr tînin; ciyek xweşik li bakurê Libnanê tê bîra min jî. Hertim ku çavên xwe dineqînim, ez wan geliyên ewqas esrarengiz û bihagiran û wan çiyayên bi zelalî û meziniyê pêçandî, yên ku xwe bilind dikin ber perên esman, dibînim.

Hertim ku guhên xwe ji qerebalixa bajar digirim, ez pistîna robaran û xişîna çeqên daran dibihîzim. Hemû vê xweşikiya han, a ku niha jê dipeyivim û bêriya dîtina wê dikim mîna ku çawa zarok bêriya bersînga dayika xwe dike, wê xweşikiyê giyanê min birîndar kir, giyan ê ku wek girtî di cahiliya xortaniyê de mîna ku baz di rekeha xwe de bibîne ku refên balindeyan li esmanê berfireh bi azadî difirin, çawa têşe,

wisan ê min jî diêşî. Wan gelî û zinaran aşop û xeyalên min şiyar dikirin lê ramanên bijan tora bêhêvîtiyê li dor dilê min vedihûnand. Hertim piştî çûna nav zeviyan, ez bi dilek şkestî vedigerîm malê bê ku bizanim ka çima. Hertim ku min li esmanê gewr dinerî, pê dihesîm ku bîntengtir bûme. Hertim ku min stranên balindeyan û pistîna biharê dibihîstin, dilê min tijî kul dibû bê ku fam bikim ka sedema van kulan çi bû. Tê gotin ku cahilî mirov xalî dike û xalîti jî mirov bêxem dike. Ew yek dikare di nav wan kesan, ên ku wek mirî hatine dinyayê û mîna laşên bêhest dijîn, de rast be, lê lawikê dilnazik, ê ku gelek tiştan dihesîne û kêman dizane, li ser rûyê erdê bextreştirîn afirandî ye çimkî du hêz wî diperitînin. Hêza yekem wî vedijîne û bedewiyên hebûnê di nav ewrê xewnan re nîşanî wî dide; hêza din jî wî bi erdê

ve girê dide û çavên wî bi tozê dikorîne û bi tirsan û nezanînê barê wî giran dike.

Tenêtiyê destên nerm û armûşî hene lê bi tiliyên xwe yên bihêz ew bi çavbirçîtî mirov digire û jan û êşan digihîniyê. Tenêtî hevgira xemgîniyê û hevrêya jihalçûna giyanî ye.

Giyanê lawik, ê ku li hember xemgîniyê li ber xwe dide, mîna sosina tam ji bo guldanê li ber peqînê ye. Ew li ber ba direcife û bi şiyarbûna rojê re dilê xwe vedike û bi hatina şevê re pelê xwe digire. Eger ew lawik di lîstik û yariyên xwe de ji xwe re heval û hevrêyan nebîne, jiyana

wî dê bibe mîna girtîgehek teng a ku ew tê ve tişteke din ji bilî torên tevnpîrkê nabîne û ji zizîna pêşûyan pêtir tişteke din nabihîze.

Ew xemgînî, ya ku bê navbir di xortaniya min de ez diêşandim, ne encama tinebûna yarî û kêfxweşiyên bû çimkî min dikarîbû wan bi dest bixim û ne jî tinebûna hevalan bû çimkî min dikarîbû wan jî peyda bikim. Ew xemgînî encama jana hundurîn bû ya ku ez kirim evîndarê tenêtiyê. Wê di min de bêrîkirina lîstik û yariyan vemirand. Wê milên min ji baskên xortaniyê şelandin û ez kirim mîna gerikek avê ya navbera çiyayan a ku sîberên giyanan û rengên ewr û daran di xwe re diteyisîne lê rêyekê nabîne ku bikare tê re bi strangotinkî

bigihe deryayê.

Ji berî ku ez bibim hejdehsalî, jiyana min wiha bû. Ew sala han di jiyana min de mîna gupika çiya ye ji ber ku wê ez ji tiştêkî haydar kirim û wisan kir ku ez qonaxên mirovatiyê fam bikim. Wê salê ez ji nû ve welidîm, û tevî wê yekê jî ku mirov vediwelide, jiyana wî mîna rûpelek nenivîsandî li pirtûka hebûnê dimîne. Wê salê min dît ku firişteyên esman bi çavên keçek bedew li min dinerin. Min herwiha dît ku şeytanên dojhê di dilê mirovê xerab de bedmebestan amade dikin. Eger mirov firişte û şeytanên di bedewî û kirêtiya jiyane de nebîne, mirov ji zanîne dûr e û hest bi evîne nake.

## DESTÊ FELEKÊ

Li wê bihara efsûneyî ez li Bêrûtê bûm. Baxçe ji gulên Nîsanê tijî bûn, giya erd niximandibû, û her tişt mîna lavayek erdê ya ji bo esman bû. Xwezayê darpirteqal û -sêvên mîna bûkan xwe bi cilên guldanê yên spî û bînxweş xemilandî ji helbestvanan re şandibûn daku aşop û xeyalên wan şiyar bikin.

Bihar li herderê bedew e lê li Libnanê ji herderê bedewtir e. Ew giyanek e ya ku li erdê digere lê li raserî Libnanê dipire û di heman demê de bi padîşah û peyamberan re dipeyive, bi çeman re stranên Hz. Silêman distre, bi Darên Selwê yên

pîroz ên Libnanê re kameraniya berê bi bîr tîne.  
Azad ji qirêjiya zivistanê û toza havînê, Bêrût li  
biharan mîna bûkekê ye yan jî mîna serperiyekê  
ya ku li rex robarekî rûniştî ye û li ber tîrêjên  
rojê laşê xwe yê nerm ziwa dike.

Rojekê ji yê biharê ez çûm seredana hevalek  
xwe yê ku mala wî qonaxekê ji bajarê efsûnî dûr  
bû. Di dema suhbeta me de, ciwamêrek  
qedirbilind ê nêzî 65-salî ket hundurî malê.  
Dema ku rabûm ser xwe ji bo ku silava wî jê  
werbigirim, hevalê min ew wek Faris Efendî  
Karamy bi min nasand û pê re jî navê min bi  
pesinandinek derîsînor mezin ji wî re anî ziman.  
Yê pîr li min nerî û bîskekê sertiliyên xwe kirin

eniya min mîna ku bi hindê tê bikoşe tişteki bîne  
bîra xwe. Piştî ew bi bişir nêzîkî min bû û got:  
"Tu kurê hevalê min ê gelekî ezîz î, û dilşa me  
ku wî hevalî di şikilê te de bibînim."

Ez ê ji ber gotinên wî bi tundî raydabûyî mîna  
balindeyan, ên ku dozîna wan ji berî  
destpêkirina bahozê ber bi hêlînên wan de  
dikişîne, ber bi wî de birim. Piştî rûniştina me,  
wî basa hevaltîya xwe ya bi bavê min re kir û  
dema wan a bi hev re anî bîra xwe. Mirovên pîr  
bi şanazî vedigerin bîranînên dema ciwaniya  
xwe mîna ku biyanî jî bêriya welatê xwe dikin û  
di ramanên xwe de hertim li wî vedigerin. Ew

dilşa dibe ku basa jiyana xwe ya raborî dike mîna helbestvan ê ku bi dilxweşî baştirîn helbesta xwe dixwîne. Ew ji aliyê giyanî de di raborîtiyê de dijî çimkî dema nihoyî bi lez derbas dibe û ayende jî bi wî mîna rêyek ber bi gora nenas de dixwiye. Bîska bi bîranînên kevn tijîkirî mîna sîbera daran e ya ku li mêrgê derbas dibe. Dema ku Faris Efendî dê biçûya, destê xwe yê çepê danî ser milê min, destê min ê rastê givaşt û got: "Ev bîst sal in ku min bavê te nedîtiye. Hêvî dikim ku tu ê ciyê wî bigirî û gelek caran bê mala min." Min wek spasdar soz da ku erkê xwe li hember hevalê xweşviyayî yê bavê xwe bi cî bînim.

Dema ku yê kal ji xanî derket, min ji hevalê xwe hêvî kir ku ji min re pêtir qala wî bike. Wî got: "Ji bilî wî ez li hemû Bêrûtê ti kesek din, ê ku dewlemendiyê kiribe xweşheval û xweşhevaliyê

jî dewlemend, nanasim. Ew yek ji wan kesinên kê m e yên ku tîn vê dinyayê û jê bar dikin bê ku ti ziyaneke bigihînin kesekî lê pirranî caran kesên wiha xemgîn û jêrdest in ji ber ku ne têra xwe jîr in daku xwe ji derewîgoyiya xelkê biparêzin. Faris Efendî keçek heye ku ew jî ji xwezaya xwe de dişibe wî û bedewî û nazenîniya wê nikare bi peyvan bê salixdan. Lê ew ê bibe kesek bextreş çimkî ji ber



dewlemendiya bavê wê hê ji niha ve jiyana wê li ber kamaxbûnê ye."

Piştî van gotinan ew rûtarî bû. Paştî domand:  
"Faris Efendî mirovek pîr î qenc e yê ku xwedî dilek cewer lê bê helwestek xurt e. Mîna ku kor be, xelk serkêşiya wî dike. Keça wî, tevî serbilindî û jîriya xwe jî, li pey wî diçe. Ev yek di navbera bav û keçê de nihînek e, û ev nihîn ji aliyê zelamek xêrnexwaz, metran, ê ku xêrnexwaziya wî di nav încîlê de tê veşartin, hatiye keşifandin. Ew metran dikare mirovan bide bawerandin ku qaşo ew qenc û cewer e. Ew li vî welatê oldar serekê olî ye. Xelk bi gotina wî dike û jê re îbadet jî dike. Ew wan mîna kerek pez ber bi qesabxaneyê de dikişîne. Metran biraziyek necis û bêexlaq heye. Ew roj ê zûtir an derengtir bê ku ew ê biraziyê xwe li rexê xwe rastê û keça Faris Efendî jî li rexê çepê dabine, bi destên xwe yên şeytanî kulîlkên çelengên zemawendê yên li ser serê wan bigire û xamaya pak û mêrê herimî bike yek û dilê rojê bixe hemêza şevê.

Her tişt, a ku dikarim ji Faris Efendî û keça wî ji te re bibêjim, ev e loma êdî hew pirsan ji min bike."

Piştî gotina xwe wî serê xwe ber bi pencereyê de zivirand mîna ku bi dalepîna (konsentrebûna) li

ser bedewiya gerdûnê tê bikoşe ku metelên  
hebûna mirov çareser bike.

Bi derketina ji xanî re min ji hevalê xwe re got  
ku ez ê di rojên nêzîk de biçim seredana Faris  
Efendî ji bo bicîananîna soza domandina wê  
hevaltiyê ya ku demekê di navbera wî bavê min  
de hebû. Hevalê min bîskekê fikir min, û min  
guherek di mîmîka rûyê wî de dît mîna ku  
gotinên min ramanek nû xistibe serê wî. Piştî  
wî raste-rast bi şêweyek bibandor, bi awirek  
evîn, berketin û tirsê li min nerî mîna  
pêxemberekî yê ku bi pêşbînî tiştan, ên ku ti  
kesek nikare bibîne, dibîne. Paşî lêvên wî hinekî  
lerizîn lê, dema ku ez ber bi derî de çûm, wî  
tişteke negot. Wê awira sosret da pey min û ji dû  
min venebû lê min wateya wê fam nekir ta ku di  
pêzanîn û tecrubeyên dinyayê de mezin bûm ku  
dil lê bi dozînkî û însiyakî ji hev serwext dibin û  
giyan lê ewqas gihîştine ku zanînê pêşwaz bikin.

### SEREDANA PÎROZGEHÊ

Di çend rojan de tenêti bi ser min de hat; bi  
lênêrîna pirtûkên acizker ve westîbûm; min ji  
xwe re amraz peyda kirin û çûm mala Faris  
Efendî. Dema ku em gihan nik daristanokek  
çamê, ya ku xelk ji bo sêranan diçiyê, rêya me  
ber bi aliyek din de çû û ji herdu aliyan de bi  
darên biyê dihat rapêçandin. Dema ku mirov bi

wê rêyê ve biç, dikare mêrgek kesk, mêwên tirî  
û gelek gulên nîsanê di ciwantirîn xemla wan de  
bibîne.

Piştî bîskeke derwaze di nav baxçeyek ciwan de  
li ber deriyê xaniyek bi tenê rawestîn. Bîna  
biheştîn a sorgul, gardenya û yasemînan hewa bi  
xwe tijî dikir. Piştî ku ji derwazeyan derketim û  
ketim nav baxçeyê mezin, min dît ku Faris  
Efendî pêrgî min tê. Wî bi bixêrhatinên ji dil ez  
gihandim hundurê mala xwe, mîna ku bav kurê  
xwe bibîne li rex min rûnişt û mişe pirs li ser  
jiyan, pêşeroj û perwerdeyiya min ji min kirin.  
Min bi şanazî ew dibersivandin çimkî min di  
guhên xwe de awazên sirûdên pesnê dibihîstin û  
min didît ku li deryaya aram a xeyalên têrhêvî  
diseyirim. Derhal keçek bedew a destek kincên  
spî yê armûşî li xwe kirî ji pişt derîperdeyên  
mexmûrî xwiya bû û ber bi min de hat. Ez û  
Faris Efendî rabûn ser xwe.

"Ev keça min Selma ye", kalo got. Piştî wî ez  
nasandim û got: "Felekê hevalê min ê ezîz di  
kurê wî de li min vegehandiye." Bîskeke  
Selmayê fikir min mîna ku guman bike ka ez ji  
bo wê hatibûm mêvaniyê. Destê wê, dema ku  
min destê xwe avêtê, mîna sosinê spî bû, û pê re  
janek sosret xwe avêt dilê min.

Em hemû bêdeng rûniştin mîna ku Selmayê bi

xwe re giyanek esmanî anîbe ku diviyabû me bi bêdengiyek tamam hurmeta wî giyanî bigirta. Piştî agahdarbûna ji vê bêdengiyê ew bi min bişirî û got: "Gelek caran bavê min basa xortaniya xwe û wan rojên pîriya xwe, ya ku wî û bavê te bi hev re derbas kirin, ji min re kiriye. Eger bavê te jî bi heman awayî ji te re peyivîbe, êdî ev hevdîtina min û te ne cara yekem e." Pîremêr bi gotinên keça xwe gelekî kêfxweş bû û got: "Selma gelekî diltenik e. Ew her tiştî bi çavên giyanê xwe dibîne." Piştî wî dîsan bi seqbêrî dest bi suhbetê kir mîna ku wî di min hêzek nêrengî dîtibe û pê bi baskên bîranînan vegeerî rabortiya xwe. Û min jî çavnêrî li wî fikir û ketim xeyala salên bînan jiyana xwe û wî mîna darek pîrî bihagiran, ya ku xwe li ber tîrêjên rojê û bahoza ragirtibe û niha di dema recifîna şitilek biçûk li ber bayê spêdeyê sîber û stara xwe biavêje ser, li min dinerî.

Lê Selma bêdeng bû. Carinan wê li min û paşî jî li bavê xwe dinerî mîna ku beşa pêşîn û ya dawîn ji şanoya jiyana bixwîne. Li nav wî baxçeyî roja me zû derbas bû û min di pencereyê re maça esrarî û zer a rojavabûnê li serê çiyayên Libnanê dît. Faris Efendî ravekirina pêzanînan xwe domand û min bi balkêşiyek ewqas ji

dilkûriyê lê guhdarî dikir ku xemgîniya wî lê bû dilxweşî.

Selma bi tenê li ber pencereyê rûniştibû, bi çavên têrxem li derve dinerî û nedipeyivî çimkî bedewiyê zimanê xwe yê ji peyvan berztir heye. Ew zimanek bêdem e, ji hemû mirovatiyê re hevbeş e, deryaçeyek aram e ya ku bala robarên stranbêj dikişîne kûratiya xwe û wan bêdeng dike.

Tenê giyanên me dikarin ji bedewiyê fam bikin, an jî jê bijîn û pê şên bibin. Ew mejiyê me bi xwe dide mijûlandin û ponijandin; em nikarin wê bi peyvan salix bidin; ew tiştêk îhsas e ku çavên me nikarin bibînin, û ew hem di mirov û hem jî di Yezdan de heye. Bedewiya rastîn tîrêjek e ya ku serekaniya xwe ji giyanê herî pîroz digire û bedenên ronî dike mîna ku jiyan jî ji kûratiyên erdê hildikeve û reng û bîne dide gulan.

Bedewiya rastîn di aheng û harmoniya giyanî de dijî û ev harmonî bi evîne tê navandin û evîn di navbera mên û jin de heye.

Ma gelo giyanê min û yê Selmayê wê rojê gihan hev dema ku me hevdu dît û ma bêrîkirina evîne wisan kir ku ez bedewtirîn keça li ser rûyê erdê bibînim? An jî ma ez ji ber şeraba xortaniyê sermest bûbûm û loma ez ketim wan xeyalan ên

ku hemberiyên wan di jiyana rastîn de tine bûn?  
Ma çavên xwezayî yên xortaniya min wisan kir  
ku ez di aşopên xwe de geşiya çavên wê,  
dilhebîniya zimanê wê û narîniya bedena wê  
bibînim? Yan jî bedewî, narînî û nazenîniya wê  
çavên min vekirin û dilşadî û xemgîniya evîne  
nîşanî min dan?

Dijwar e ku ev pirs bîn bersivandin lê ez  
dilvekirî dikarim bibêjim ku wê bîskê min hest  
bi tişteki kir ku berî hingê qet pê nehesîbûm,  
zewqek nû ya ku bi aramî ketibû dilê min mîna  
wî giyanî yê ku di dema afirandina cîhanê de li  
ser avê dipirî, û ji wê hestê bextiyarî û  
bextreşiya min afirî. Bi vî awayî yekemîn  
hevdîtina min bi Selmayê re bi dawî hat û bi vî  
şêweyî îradeya esmanî ez ji bend û zincîrên  
xortanî û tenêtiya min azad kirim û hişt ku ez jî  
bi karwanê evîne re bimeşim.

Di dinyayê de tenê evîn dikare mirov azad bike  
çimkî ew wisan giyanê vedijîne ku ne zagonên  
mirovatiyê û ne jî diyardeyên xwezayê dikarin  
wê biguherînin.

Dema ku ji bo çûnê rabûm ser xwe, Faris Efendî  
hat nêzîkî min û bi aramî got: "Belê lawê min,

madem tu êdî rêya vê malê dizanî, divê tu gelek  
caran bê û xwe li mala bavê xwe hes bikî. Min  
wek bavê xwe û Selmayê jî wek xwişka xwe

bipejirîne." Piştî vê gotina xwe ew li Selmayê zivirî mîna ku daxwaza pejirandinê ji wê jî bike. Selmayê bi wateya "baş e" serê xwe çemand û, mîna ku ez nasek wê yê ji mêj de bim, li min nerî.

Bi wan gotinan Faris Efendî Karamyy ez bi keça xwe re danîm huzûra evînê. Ew peyv mîna stranek esmanî bûn a ku ji jihalçûnê dest pê kir û bi xemgîniyê bi dawî hat; wan peyvan giyanên me birincîhana ronahî û tarîtiyê; ew qedehêk bû ku me bextewarî û bextreşî jê vexwarin. Ji xanî derketim. Pîremêr ez gihandim kenara baxçe, û di heman demê de dilê min dilerizî mîna lêvên mêrek tî dilerizin.

## PÊTALA SPÎ

Meha nîsanê li ber xelasbûnê bû. Ez bi berdewamî çûm mala Faris Efendî daku Selmayê bibînim, li bedewiya wê binerim, heyraniya jîriya wê bikim û li bêdengiya xemgîniyê guhdarî bikim. Ez wisan pê dihesîm ku destek nebîn min ber bi wê de dikişîne. Her seredanekê têgihek nû ji bedewiya wê û averûyek ji giyanê wê yê nazik da min ta ku ew bû pirtûkek a ku min dikarîbû ji rûpelên wê fam bikim û sirûdên pesnê jê re bistrim lê ticaran nikarim dev ji xwendina wê berbidim. Keçek, a ku felekê bedewiya giyanî û bedenî dabiyê,

rastiyek e, hem vekirî û hem jî girtî, rastiyek e  
ya ku em bi tenê dikarin bi evînê tê bigihin û bi  
tenê bi xawênîyê dest bikinê; û eger em hewl  
bidin wê keçê salix bidin, ew ê mîna mijê wenda  
bibe.

Selma Karamy bi beden û giyanê xwe ve bedew  
bû lê ma çawa ew dikare ji wan kesan, ên ku  
ticaran ew nedîtiye, re bê teswîrandin? Ma mirî  
dikare strana bilbil, bîna sorgulê û xuşîna robar  
li bîrê be? Ma girtiyê bi giranî zincîrkirî dikare  
bide pey nefesa bayê berbangê? Ma bêdengî ne  
ji mirinê bijantir e? Ma fêz û xurûr rêyê li ber  
min digire ku Selmayê bi peyvên sade salix  
bidim çimkî nikarin bi peyvên biriqdar û

wategiran dabaş jê bikim? Jixwe yê birçî li  
çolistanê xwarina nanê hişk red nake eger  
Yezdan ardik û gurxeniqan nediyê.

Di kincên xwe yên armûşî yên spî de Selma,  
mîna tîrêjên hîverona di pencereyê re tîn, narîn  
bû. Ew bi çavhebînî û bi rîtm dihat û diçû.

Dengê wê nizm û şîrîn bû, peyv mîna çipên ji  
belgên gulan, dema ku ba ew dawêşandine,  
diketin.

Û rûyê Selmayê! Ti peyv û bêje nikarin nikarin  
wê mîmîka rû, ya ku pêşî janek mezin a  
hundurîn û dû re jî jîhişçûna esmanî nîşan didan,  
salix bide.



Bedewiya rûyê Selmayê ne klasîk bû; ew mîna pêşdariyek yezdanî bû ya ku nikare bi firçeya nîgarkêş an jî eskeneya heykeltiraş bê texmîn-, sînor- û peyrewîkirin. Bedewiya Selmayê ne di pirça zêrîn de bû lê di dilpakî û paqijiya li dor wê pirçê; ne di çavên wê yên mezin de lê di ronahiya ji wan dihat de; ne di lêvên wê yên sor de lê di peyvên ji nav wan derdiketin de; ne gerdena wê ya mahî û diranfîlî de lê di kevaneya tenik a wê gerdenê de. Bedewiya wê herwiha ne ji bêmasîtiya bedena wê lê ji giyanê wê yê berz dihat û ev giyan mîna pêtal û meşaleyek spî di navbera erd û esman de vexistî û hilkirî bû. Bedewiya wê mîna helbestvaniyê ye. Lê helbestvan kesên bextreş in çimkî giyanên wan çiqas tê bikoşin jî, demamika hêsir û ronikan rêyê li ber wan digire.

Selma ji bêjekariyê pêtir kûrponij bû, û bêdengbûna wê mîna muzîkê bû ya ku ez dibirim cîhana xewn û xeyalan a ku min lê dengê lêdana dil dibihîst û li pêş xwe sî û sîbera raman û hestan didît.

Wê di hemû jiyana xwe de hawranê xemgîniyê hildigirt û pê bi tenê, her ku diçû, bedewî û bihagiraniya wê ya sosret zêdetir dibû mîna ku dar jî di gulvedaniya xwe de ji hingê bedewtir e ku di nav mija spêdeyê de bê dîtin.

Xemgîniyê em herdu wisan kiribûn hevpar ku me herduyan ji rûyê hevdu didît ka dil hest bi çi dikir û dengê nihînîkirî dibihîst. Yezdan du mirov kiribûn yek, û veqetandina wan ji hev dê bi tenê kul û derd bianîna.

Eger giyanê xemgîn yekî şibî xwe bibîne, ew aram dibe. Bandorek kûr li wan dibe û, mîna ku xerîbek li welatek biyanî xerîbekî bibîne, îradeya wan dibe yek. Dil, ên ku bi xemgîniyê digihin hev, ji ber jihalçûna bextewariyê jî ji hev naqedin. Evîn, a ku bi hêsir û ronikan hatiye paqijkirin, dê bi abadîni pak û bedew bimîne.

## BAHOZ

Rojekê Faris Efendî ez ji bo firavîniyê vexwendim mala xwe. Min vexwendina wî pejirand, giyanê min bêriya nanê yezdanî dikir, nanê Yezdan xistibû destê Selmayê, nanê giyanî yê ku, her ku zêdetir bê xwarin, pêtir mirov birçî bike. Eynî ev nan bû yê ku helbestvanê ereb Qeys, Dante û Sapfo çêj kiribûyê û wî nanî dilên wan dan çirûskandin, nan ê ku Xweda di çêkirina wî de şîrîniya maçan û dilêşiya ronikan tevî dike.

Dema ku giham mala Faris Efendî, min dît ku Selma li ser doşkekî li nav baxçe rûniştibû û piştî xwe dabû darekê, û ew di kincên xwe yê spî yê armûşî de mîna bûkekê bû yan jî mîna periyek rind a ku zêrevaniya baxçe dikir.

Bi bêdengî û bi hurmet nêzîkî wê bûm, û li rex wê rûniştim. Min nedikarî bipeyivim loma min xwe spart bêdengiyê ango zimanê tenak ê dil lê min hest pê fikir ku Selmayê li peyivîna min a bêpeyv guhdarî fikir û di çavên min de li sîbera giyanê min dinerî.

Piştî çend deqeyan bavê wê hat û ez silav kirim. Dema ku wî destê xwe raberî min kir, min wisan hest kir ku wî dixwest hemû nihînên di navbera min û keça xwe de teqdîs bike. Dû re got: "Firavîn amade ye, zarokino, werin em bixwin."

Em rabûn û me da pey wî û çavên Selmayê dibiriqîn çimkî bi wê yekê, ku bavê wê em bi zarokên xwe bang dikirin, hesek nû tevlî jiyana wê kir.

Em rûniştin ser sifreyê, me xwarinên bi dilê xwe xwarin û çêj kir şeraba kevn lê giyanên me ji dinyayê dûr bûn, em bi xeyalên xwe re li pêşerojê û nav belayên wê bûn.

Di ramanên xwe de sê mirov dikarin ji bingehên xwe ji hev cuda bin lê di evîndariyê de ew dişibin hev. Sê mirovên bêguneh ên ku hestên xurt hebûn lê kêm tişt dizanîn; ev şano ji aliyê sê kesan de dihat lîstin: pîremêrekî, yê ku ji keça xwe hez fikir û ji ber bextewariya wê xemxwar bû, keçek 20-salî, ya ku nearam li diwaroja xwe dinerî, xortekî, yê ku xeyal û tirs hebûn, ê ku

ticaran ne şerab û ne jî sêka jiyanê çêjandibû, û  
tê dikoşî ku xwe bigihîne gupika evîndarî û  
zanyariyê lê di têkoşîna xwe de bi ser nediket.  
Em her sê di wê tarîtiya êvarê de li wê mala varê  
rûniştibûn û me dixwar û vedixwar, li wê malê  
ya ku çavên Yezdan goyînî lê fikir lê dîsan jî  
dilêşî û jan di binê qedehên me de bû.  
Dema ku me xwarina xwe bes kir, yekê ji  
xedaman diyar kir ku mêrek li ber derî bû  
dixwest Faris Efendî bibîne. "Ew kî ye?" kalo  
pirsî. "Şandiyê metran e", xedamê got. Bîskekê  
bêdengî bû, paşî Faris Efendî fikir keça xwe  
mîna ku pêxember ê ku li Esman binere daku

pêşbîniyê di nihînên wî de bike. Piştî ji  
xizmetkarê re got: "Bihêle bila bê hundur".  
Dema ku xedam çû, mêrek bi unîformên  
rojhilatî, yê ku xwedî simêlên bor ên ji koka  
wan ber bi jor de badayî bû, hat, kalo silav kir û  
got: "Metranê qedibilind ez şandime daku we bi  
derwazeyên wî yên ferdî bibim cem wî; ew hêvî  
dike ku li ser xilmetek girîng bi we re gotûbêjê  
bike." Kalo rûtarî bû û bişir ji ser rûyê wî wenda  
bû. Piştî ponijînek biseqbêr ew hat nik min û bi  
dengek xweşhevalî got: "Hêvîdar im ku ta  
vebigerim, tu ê li vir bimînî çimkî Selma li vê  
ciyê dûrî jiyangehan bi dîtina gelekî şa dibe."  
Piştî van gotinan ew li keça xwe zivirî, bişirî û

helwesta wê pirsî. Keçê bi rûyê xwe bersiva erênî da lê gepên wê sor bûn û wê ji dengê lîrê jî şîrîntir got: "Çi ji min bê, bavo, ez ê teksîr nekim ji bo ku mêvanê me dilşa bikim."  
Selmayê li wan derwazeyan, ên ku bavê wê û peyamberê metran birin, ta ku ew ji ber çavan wenda bûn. Paşî ew hat û li ser rûniştoka bi armûşê kesk raxistî ya li pêşberî min rûnişt. Ew mîna sosinek bi ji aliyê bayê spêdeyê de li çîmenekê tewandî dixwiya. Ev îradeya esmanî bû ku ez vê êvarê li mala bedew a daran dorlêgirtî, li mala dergûşa bêdengî, evîndarî, bedewî û dilpakiyê, bi Selmayê re lê bûm. Em herdu bêdeng bûn û li bendê bûn ku ya/yê din dest bi axivînê bike lê di navbera du giyanan

de peyivîn ne tenak şêwe ye ku mirov dikare ji hev fam bike. Peyv, ên ku ji ser ziman tîn û ji nav lêvan derdikevin, nikarin dilan bigihînin hev.

Tiştê ji peyvan, ên ku dev dikare rabigihîne, gewretir û paktir jî heye. Bêdengî giyanên me ronî dike, ji dilên me re dipiste û û wan bi hev digihîne. Bêdengî me ji me bi xwe vedike, me li ser rûyê esman dide seyirandin û me pêtir nêzîkî Yezdan dike; ew bi me dide hesandin ku bedena me bi tenê zindan e, û ku ev dinya bi tenê revgeh e.

Selmayê li min nerî, û çavên wê nihîna dilê wê diyar diyar kir. Piştî wê bi dengê nizm got: "Em biçin nav bexçe û li binê daran rûnin û li hilhatina heyvê ya ji pişt çiyayan temaşe bikin." Min bi gotina wê kir û ji ser rûniştika xwe rabûm lê dilê min biguman bû.

"Ma bi baweriya te ne baştir e em li vir bin ta ku heyv hilbê û bexçe ron bike?" Û min bi xwe domand: "Tarîti dar û gulên di nav xwe de radipêçe. Em ê nikarin tiştê bibînin."

Paşî Selmayê domand: "Tevî ku tarîti nehêle ku em bi çavên xwe dar û gulên bibînin jî, ew nikare evîna dilên me vebîşêre."

Piştî van gotinên bi deng û awazek xerîb wê çavên xwe ji min girtin û di pencereyê re li derve nerî. Dû re wê dîsan li min nerî mîna ku ji

gotinên xwe poşman bûbe û tê bikoşe ku bi hêza efsûnî ya awira çavên xwe wan peyvan dîsan ji min bistîne. Lê wan çavan, li şûna ku wan peyvan ji min bistînin, ew peyvên şîrîn, ên ku bi abadîniyê xwe di bîranîniyê de veqetandibû, hê zelal û rontir di kûratiyên dilê min de dan dubarekirin.

Hemû bedewî û gewretiya li vê cîhanê heyî bi tenê bi hêza raman an jî hestek di hundurê mirov de hatiye afirandin. Her tişt, ê ku em niha wek bidestxistiyên nifşên pêştir dihesibînin, carekê bi

tenê ramanek di mejiyê mêr an jinekê de bû.  
Şoreş, ên ku ew qas xwîn da rêtin û mirov fêrî  
ramîna azadiyê kirin, bi tenê encama raya kesek  
di nav hezaran kesan de bûn. Cengên ruxîner, ên  
ku dewlet û împaratorî hilweşandin, serekaniyên  
xwe ji ramanên di serên takekesan de distendin.  
Ew zanînen bêmînak hêja, ên ku dîroka  
mirovatiyê guherand, bîreweriyên mirovek  
wisan bûn ku zekaya wê/wî ew ji hawirdora di  
nav de cuda dikir. Tenê yek raman bû sedema  
avakirina pîramîdan, gulvedana îslamê û  
şewitandina Pirtûkxaneya Îskenderyayê.  
Tenê ramanek bi şevê ketî serê te dikare te bike  
navdar an jî bixe nexweşxaneyê. Awirek keçekê  
dikare te bike bextewartirîn mêrê cîhanê. Tenê  
peyvek ji ser lêvên mirovekî dikare te bike  
dewlemend an jî belengaz.  
Wê peyvê, ya ku Selmayê wê şevê ji min re got,  
ez di navbera paşeroj û pêşeroja min de berbend

kirim û girê dam mîna keştiyekê ya ku li nava  
deryayê hatiye strîngandin. Wê peyvê ez ji xew  
û tenêtiya xortaniya min şiyar kirim û avêtim ser  
sehneya jîn û mirinê.

Bîna gulên têkelî nav nefesa ba dibû dema ku  
ew hatin nav bexçe û bêdeng li ser doşkek li  
nêzî daryasemînê rûniştin, me li helpîna  
xwezaya razayî guhdarî dikir û çavên esman jî

govanên lîstika me bûn.

Heyv ji pişt Çiyayê Sunin hilhat û roniya xwe da perav, zinar û çiyayan; û me dikarîbû bibînîn ku gundan milbendî li gelî fikir mîna sawêr û sipêleyan ên ku derhal ji valatîyê hatibûn afirandin. Me hemû bedewiya Libnanê di tîrêjên zîvîn ên heyvê de didît.

Helbestvanên Rojavayê Libnanê mîna deverek efsaneyî dihesibînîn ku piştî mirina Dawid, Silêman û pêxemberên din hatiye jibîrkirin mîna ku çawa bexçeyê biheştê jî piştî gunehkariya Adem û Hawayê ji bîr bû. Ji wan helbestvanan re Libnan peyvek şaîrane ye û girêdayî çiyayê bi bîna Darselwiyên Pîroz dorpêçandî ye. Peyva Libnan pîrozgehên misî û mermerî, yên ku pêt û bêhej li ser xwe ne, û garanên xezalan, ên ku li geliyan diçerin, tîne bîra wan. Wê şevê min Libnan bi xewnek bi çavên helbestvanan dît. Rastiya van tiştan li gor rewşa me ya giyanî diguhere, û em di wan de bedewî û efsûnetiyê

dibînîn dema ku bedewî û efsûnetî di rastiyê de di me bi xwe de ye.

Dema ku tîrêjên heyvê li rû, gerden û zendên Selmayê da, ew mîna peykelekî bû ku ji aliyê destên xizmeta Xwedaya Evîn û Bedewiyê Îştare dikin de hatibe teşedan. Dema ku li min nerî, wê got: "Tu çima bêdeng î? Tu çima ji min



re tiştêkî ji jiyana xwe ya borî bas nakî?" Dema min li wê nerî, bêdengiya min nema, min lêvên xwe vekirin û got: "Ma te nebihîst ka min çî got dema em hatin nav vî bexçeyî. Ruh, a ku pistîna gulan û awaza bêdengiyê bibihîze, dikare qîrîna giyanê min û nearamiya dilê min jî bibihîze."

Selmayê destên xwe dan ber rûyê xwe û bi dengê lerizok got: "Belê min tu bihîstî - min bihîst ku deng ji hemêza şevê tê û qîrîn ji dilê rojê hildikeve."

Piştî ku min jiyana xwe ya borî, hebûna xwe jî - her tişt ji bilî Selmayê - ji bîr kir, min ew bersivand: "Û min jî tu bihîstî, Selma. Min bihîst ku muzîkek xemrevîn li hewa lê dixê û hemû cîhanê dide bizivandin."

Bi bihîstina van peyvan wê çavên xwe neqandin û min dît ku li ser lêvên wê bişîrek şîrîn têkelî nav xemgîniyê dibû. Ew bi dengê nizm pistî: "Niha dizanim ku tiştêk ji esman bilindtir û ji oqyanûsan kûrtir û ji jiyan, mirin û demê nenastir heye. Niha tiştêk min berê nizanîbû dizanim."

Wê gavê Selma bû kesek ji hevalekê bihagirantir, ji xwişkekê nêzîktir û ji evîndarekê hezkirîtir. Ew bû ramanek cewer, xewnek bedew û hestek hêzdar a ku di giyanê min de dijiya. Çewt e bê bawerkirin ku evîn encama

hevalbendiyek demdirêj an têkoşînek ji bo bidestxistinê ye. Evîn berhema zewaca derûnî ye, û eger agirê wê derhal geş nebe, ne sal û ne jî zeman dikarin wê geş bikin.

Piştire Selmayê serê xwe rakir, li qeraxa esman, ciyê Çiyayê Sunin û esman digihin hev nerî û got: "Do tu ji min re mîna birayekî bûyî yê ku li ber stara bavê xwe pê re dijiyam û bi aramî pê re rûdiniştim. Lê niha ez hest bi tiştêk ji hesên biratiyê hê xerîbtir û şîrîntir dikim, têkeliyek sosret a evîn û tirsê, û ew hest dilê min bi xemgînî û bextiyariyê dadigire."

Min bersiva wê da: "Ew hest, a ku em jê ditirsin û ya ku dema xwe li dilê me dide zagonek xwezayî ye ku heyvê li dor zemînê û zemînê jî li dor Yezdan dide zivirandin."

Wê destê xwe danî ser serê min û pirça min perixand. Rûyê wê pengivî û hêsir û ronik ji çavên wê gindirîn mîna ku çipên avê dikevin ser belgên sosinê û wê got: "Kî dê çîroka me bawer bike - kî dê bawer bike ku aniha em bi ser hemû astengên şik û gumanan ketine? Kî dê bawer bike ku meha Nîsanê, ya ku yekem car em

gihandin hev, mehek e ku em di Pîrozweriya herî berz a jiyanê de dîtin."

Destê wê hê jî li ser serê min bû û min ê ew destê bedew û nerm, ê ku pirça bi min re hatibû

girêdan, bi ti tacên padişahî û çelengên şanazî û rûmetê nedaya.

Loma min bersiva wê da: "Xelk ji çîroka me bawer nake çimkî ew nizanin ku evîn tenak gul e ku li hemû demsalan şên dibe û dibişkive lê ma bi rastî jî ew meha Nîsanê bû ya ku cara yekem em bi hev nasandin û wê bîskê em di Pîrozweriya herî berz a jiyane de gihandin hev? Ma ew ne destê Yezdan bû ku giyanên me ji berî welidîne gihandin hev û em bi şev û rojan bi hev re berbend kirin? Jiyan mirov ne ji zikê dayikê dest pê dike û ne jî di gorê de bi dawî tê; û ev qeraxa esman, a ku tijî hîveron û stêran e, ji aliyê giyanên evîndar û ruhên bînbar de nayê tenêhiştin."

Dema ku wê destê xwe ji ser serê min rakir, min hesek mîna lerizek karebayî ya bi bagera şevê re yekbûyî di rîşên pirça xwe de hes kir. Mîna nivêjkerek kûrbawer, ê ku altara pîrozgehê dimaçîne, min dest avêt destê Selmayê, lêvên xwe yê agirgur danîn ser û demek dirêj ew maç kir, ew bîranîn dilê min dihelîne, û bi nazenîniya xwe her xeyala bedew di giyanê min de dikemilîne.

Saetek derbas bû, her deqeyek wê mîna salek evîntijî bû. Bêdengiya şevê, hîveronê, gulan û daran wisan dikirin ku em her rastiye ji bilî

evînê ji bîr bikin ta ku me qutîna simên hespan û xilingîna xirxalên derwazeyan bihîstin. Piştî ku em ji cîhana xewnên dilhebîn hatin şiyarkirin nav cîhana nearamî û belengaziyê, me dît ku pîremêr ji xilmetên xwe vegehbû. Em rabûn û di nav cinîna re ber bi wî de çûn.

Dema ku derwaze gihan ber deriyê bexçe, Faris Efendî ji wan hat xwar û hêdîka ber bi me de hat, hinekî piştçemiyayî mîna ku barek giran li ser milê wî be. Ew nêzîkî Selmayê bû, herdu destên xwe danîn ser milên wê û fikirê. Ronik bi gepên wê yên qurmiçî ve diherikîn, û lêvên wî bi bişîrek xemgîn direcifîn. Wî bi dengê fetisîner got: "Selmaya min a xweşviyayî, tu ê di demê nêzîk de ji hemêza bavê xwe bê derxandin û bikevî hemêza mêrek din. Di demê gelekî nêzîk de felek dê te ji vê mala bi tenê bibe nav bexçeyê cîhana fire, û ev bexçe dê bêriya şopên piyên te bike, û tu ê ji bavê xwe xerîb bibî. Her tişt hatiye kirin; Yezdan te biparêze." Bi bihîstina van gotinan rûyê Selmayê tarî bû, û çavên wê bêliv man mîna ku ew bi mirinê hesîbe. Piştî wê mîna balindeyek beradayî bi jan û bi recif qîrî û bi dengê fetisînende got: "Tu çi dibêjî? Ev çi gotin in? Tu ê min kû de bişînî?"

Paşî wê li bavê xwe nerî, lê kolî û tê koşî ku

nihîna wî diyar bike. Piştî bîskekê got: "Ez tê digihim, her tiştî fam dikim. Metran tu mecbûrî dana min kirî û ji vê balindeya baskşkestî re rekeyek çêkiriye. Ma ev xwesteka te ye, bavo?" Bersiva bavo axînek kûr bû. Wî bi dilnermî da pêşiya Selmayê û ew ketin hundur; ez li ser piyan li nav bexçe mam û pêlên bêhêvîtiyê ez mîna pelên daran li payizan li ber bageran veçirandim. Paşî min da pey wan û çûm odeya rûniştinê û ji bo ku nebim sedema matbûnê ez çûm destê pîremêr, min li Selmayê, li stêra xwe nerî û ji xanî derketim.

Dema ku giham ber qeraxa bexçe, min bihîst ku pîremêr bangî min dike û li ser milê xwe zivirîm daku wî bibînim. Wî xwe avêt destê min û got: "Bibexşe ku min êvara we bi hêsiran herimand lê hêvî dikim ku tu her bê seredana min dema ku mala min xopan be, û ez bi tena serê xwe û bêhêvî bim. Ciwanî, lawê min, bi pîriyê re xweşnûd nabe mîna ku spêde jî pêrgî şevê nayê; lê ji bo bîranînên xortaniya min û rojên min bi bavê te re borandî were cem min û nûçeyên jiyana ez êdî jê bêpar ji min re bibêje. Ma tu naxwazî bê cem min eger Selma çû û ez li vir di tenêtiya xwe de me?"

Bi gotina van peyvan re û dema ku destê wî di destê min de bû ez pê hesîm ku ronikên germ ji çavên wî diketin ser destê min. Ez mîna

zarokekî dilerizîm û wisan dixwiya ku trajediyê

dê dilê min fetisandibûya. Dema ku min serê  
xwe rakir, wî hay ji hêsirên min bû, xwe ber bi  
min de tewand û lêvên xwe gihandin eniya min:  
"Bi xêr biçî, lawê min, bi xêr..."

Hêkira kesek pîr ji ya ciwanan pêtir mirov dide  
bawerkirin çimkî ew di bedena wî ya lawaz dibe  
de mîna xilteya jiyane ye. Ronikên ciwanan  
mîna çipên avê ne ku dikevin ser pelên sorgulan  
lê hêsirên pîran mîna pelên zer û beyî ne ku bi  
nêzîkbûna zivistanê re ba diwerîne.

Ez ji mala Faris Efendî Karamy çûm lê gotinên  
Selmayê di guhên min de deng vedidan,  
bedewiya wî mîna sîberekê dida pey min û  
ronikên bavê wê hêdîka li ser destê min ziwa  
dibûn.

Çûna min mîna reva Adem a ji biheştê bû lê  
Hawaya dilê min ne bi min re bû ku em bi hev  
re hemû cîhanê bikin biheşt. Wê şevê, ku ez ji  
nû ve welidîm, min hest kir ku yekem car rûyê  
mirinê dibînim.

Bi vî awayî tav bi germiya xwe zeviyan vedijîne  
û difetisîne.

### DERYAÇEYA AGIRÎN

Her tişt, a ku mirov di tarîtiya şevê de vebişêre,  
bi eşkereyî di ronahiya rojê de xwiya dibe.

Peyvên di tenêtiyê de bilêvkirî bi derbeyekê dibin mijara gotûbêjên giştî. Kirin, ên ku em îro di starên jîngehên xwe de vedişêrin, sibê dê li kuçe û kolan suhbet jê be.

Bi vî awayî ruhên tarîtiyê sedema hevdîtina metran Bulos Galib û Faris Efendî anî ziman, û ev suhbet di nav hemû cîranan de dihat kirin ta ku ew hat guhên min jî.

Suhbeta metran Bulos Galib û Faris Efendî ne li ser pirsgirêkên belengaz, jînebî û sêwîyan bû. Sersedema wê yekê, ku metran peyamberê xwe şandibû pey Faris Efendî û ew bi derwazeyên xwe yê ferdî gihand cem xwe, nîşanîkirina Selmayê bi biraziyê metran, Mensor Bey Galib re bû.

Selma tenak zaroka Faris Efendiyê dewlemend bû, û metran jî ew bijart - ne ji ber bedewî û giyanê wê yê cewer lê ji ber maliyeta bavê wê, ya ku dahatineka baş ji Mensor Bey re anî û ew kir kesatiyek girîng.

Ji bo rêveberên dêrên Rojhilat tenê bertîl ne bes in lê ew bi her awayî tê dikoşin ku malbatî û xizmên xwe yê din jî bikin kesên bibandor û

destbihêz. Hêza desthilatîyê ya hukumdaran bi rêya mîratê ji kurê mezin re ye lê diyardeyek gelemper e ku ew bira û birazayên xwe dikin serekên olî. Bi vî awayî metranên xaçperest,

îmamên mihemedî û qeşeyên brahmayî dibin  
mîna mamarok û marîjokan ên ku bi gelek şaxan  
xwe bi gorî û qurbanên xwe ve dizeliqînin û bi  
bêhejmar devan xwîna wan dimêjin.

Dema ku metran Selma ji biraziyê xwe re xwest,  
tenak bersiv, a ku wî ji bavê keçê wergirt,  
bêdengiyek kûr û ronikên herikende bûn çimkî  
bavê wê qet ji wê yekê hez nedikir ku dev ji  
tenak keça xwe berbide. Giyanê her mêrekî  
dilerize dema ku divê ew dev ji tenak keça xwe,  
ya ku wî mezik kiriye û kiriye zeriye, berbide.  
Xemgîniya dêbavan a ji ber zewicîna keçê bi  
qasî wê bextewariyê ye ku kur bi zewicîna xwe  
re ji dêbavên xwe re tîne çimkî kur endamek din  
jî li malbatê zêde dike lê bi zewacê keç bi  
abadîni ji dest dêbavan diçe.

Faris Efendî bi tenê ji mecbûrî û bi bêdiliya xwe  
daxwaza metran pejirand çimkî wî baş biraziyê  
metran dinasî û qenc dizanî ka ew çi qas  
xeternak û bîje, tijî kîn, bêwijdanî û bêexlaqî bû.  
Li Libnanê ti kesek nikare li hember metran  
gotinekê bibêje û dîsan jî di rewşek baş de  
bimîne. Bê ku şerefa xwe wenda bike, ti kesek  
nikare bi gotinek metran neke. Çav nikare bêyî

peqînê li dij rimê rabiweste û dest nikare bêyî  
jêbûnê xwe biavêje şûr.

Eger Faris Efendî bi gotina metran nekiribûya û



daxwaza wî nepejirandibûya, şerefa Selmayê dê pûç bûbûya, û lêv û zimanên herimî dê navê wê rezîl bikira. Destê rûvî negihe tirî, dibêje ew tirş e.

Bi vî awayî felekê destê Selmayê girt û ew mîna koleyek sernerm ew rakişand, ku ev yek jî pirranî caran para keç û jinên bextreş ên Rojhilat in. Ê bi vî awayî giyanê cewer ket xefikê piştî ku bi azadî bi baskên spî li esmanê heyvê ronkirî, yê ku gulan biheştbîna xwe lê belav kiribû, firî.

Li hin welatan dewlemendiya dêbavan dibe sedema bextreşiya zarokên wan. Parzûnê mezin û giran, ê ku dê û bav bi hev re dewlemendiyên xwe civandiniyê, li zarokên wan dibe zîndanek teng û tarî. Dînara mihrevan û hemûzan û hemûkar, a ku mirov wê diperêsin, dibe decal. Ew giyan îşkence dike û dil dikuje. Selma Karamy yek ji wan bû ya ku gorî dewlemendiya dêbavên xwe û çavbirçîtiya mêrê xwe bû. Eger bavê wê ne ew qas dewlemend bûya, Selma dê hê niha jî bi bextiyarî bijiya.

Hefteyek derbas bûbû. Tenê evîna Selmayê hevbenda min bû ku ji min re bi şevan stranên bextewariyê distrî û spêdeyê şiyar dikirim daku ji min re basa mebesta jiyanê û nihînên sirûştê

bike. Ew evîndariya esmanî ye û ji dexesiyê

azad e, ew dewlemendî ye û dîsan jî ticaran  
ziyanê nagihîne kesekî. Ew hestek kûr a  
hevbendiyê ye û giyanê mirov di şahiyê de dişo;  
birçîtiyek kûr a dilnermiyê ye û, ku hat  
xwarandin, giyan bi merdiyê dadigire; dilnermî  
ye ku hêviyek neşkê diafirîne, dinyayê dike  
biheşt û jiyane dike xewnek şîrîn û bedew.  
Spêdeyan, dema ku ez li nav mêrgan digerîm,  
min delîl ji abadîniyê di şiyarbûna xwezayê de  
didît, û dema li berava deryayê rûdiniştim, min  
dibihîst ku pêlan stranên abadîniyê digotin. Û  
dema li kuçe û kolanan digerîm, min bedewî û  
biriqdariya mirovatiyê di rûyên rêveçûyan û  
bizavên karkeran de didîtin.  
Ew roj mîna sîberan di ber min re derbas bûn û  
mîna ewran wenda bûn û di demek kurt de êdî ji  
bilî bîranînên xemgîn tişteke bi min re nema.  
Çavan, ên ku min pê li bedewiya biharê û  
şiyarbûna xwezayê dinerî, êdî nedikarî ji bilî  
xişma bahozê û belengaziya zivistanê tişteke  
bidîta. Guhan, ên ku min berê pê bi şanazî li  
stranên pêlan guhdarî dikir, êdî tenê zûrîna ba û  
hurmîna deryayê li hember zinarê qinc  
dibihîstin. Giyan, ê ku bi bextewarî li têkoşîna  
bêwest a mirovatiyê û biriqdariya gerdûnê  
temaşê dikir, bi haydarbûna ji dilşkestin û  
biserneketinê bînteng dibû. Tişteke ji wan rojên  
evîndariyê şîrîntir û ji wan şevên erjeng ên

xemgîniyê taltir tine bû.

Ji ber ku min nema dikarî xwe bigirim, ez dawiya hefteyê car din çûm mala Selmayê - wê pîrozgehê ya ku Bedewiyê ava kiribû û Evînê teqdîs kiribû, ya ku giyan dikare lê ayindariyê bike û dil bi sernermî ji bo nivêjê xwe dide ser çokan. Dema giham nav bexçe, min hest pê kir ku hêzek min ji vê cîhanê derdixe, û dibe bilindahiyê ya ku ji berxwedan û belayan azad bû. Mîna mîstîkvan, ê ku pêşdariya yezdanî ji Esmen dibîne, min xwe di nav dar û gulan de dît, û dema nêzî deriyê xanî bûm, min dît ku Selma li ser rûnişteka ber sîbera daryasemînê rûniştî bû, heman rûnişteka em herdu berî hefteyekê li ser rûniştibûn, li wê şevê ya ku Felekê bextiyarî û xemgîniya min wek serekanî bijartibûn.

Dema ez nêzî Selmayê bûm, ew qet nelivî û ne jî dengê ji xwe derxist. Wer dixwiya ku wê dizanîbû ku ez ê bihatama cem wê, û dema li rex wê rûnişt im, wê bîskekê li min nerî û bi giranî axî, paşî rûyê xwe ji min girt û li esman nerî. Û piştî bîskek bêdengiyek sosret ew dîsan li min zivirî, bi destên recifok destê min girt û bi dengê xeyirî got: "Li min binere, hevalo, rûyê min seh bike û tiştê nîkarim bi deng bibêjim ji wî bixwîne. Li min binere, ezîzê min... li min

binere, birayo."

Min bi yekbêjî li wê nerî û min dît ku ew çav, ên ku berî çend rojan dibişirîn, û herwiha jî ew lêv, ên ku mîna baskên bilbil dilivîn, niha mirî bûn û xem û êş ji wan diteyisîn. Rûyê wê, yê ku dişibî

belgên nûvebûyî yên sosinên rojê maçandî, çilmisîbû û bêreng bûbû. Lêvên wê yên şîrîn bûbûn mîna sorgulên beyî û pelwerî yên ku payizê hê nekujandibûn. Gerdena wê, ya ku mîna stûnek mermerî bû, niha ber bi pêş de çemîbû mîna ku nikaribe barê giran ê xeman ê li ser serê xwe hilbigire.

Min ev hemû guher di rûyê Selmayê de dîtin lê ji min re ew bi tenê mîna ewrekî bûn, yê ku bi leza birûskê derbas dibe, ewrekî rûyê heyvê bigire û wê ji berê jî bedewtir bike. Awir, a ku pest û çewsa hundurîn dide xwiyandin, bedewiyê zêdetir dike tevî ku di heman demê de neynik û awêneya kul û xeman e jî; lê rûyên bêderbir û bêîfade ne û nihînen veşartî diyar nakin, ne bedew in tevî ku taybetmendiyên birêz di wan de hebin jî. Eger rengê meyê di krîstala zelal re neyê dîtin, qedeh nikare bala lêvên me bikişîne.

Wê şevê Selma mîna îskanek meya esmanî bû ya ku hem talî û hem jî şîrîniya jiyanê tê de hatiye têkilandin. Bê ku bizane, ew bûbû

sembola keçên Rojhilat ên ku ticaran dev ji mala dêbavên xwe bernadin ta ku barê mêrê xwe hilnegirin ser milên xwe û hemêza dayika xwe ya xweşviyayî bernadin ta ku mecbûr nebin ji ber muamele û dilreşiya xesûyên xwe di koletiyê de bijîn.

Min bi berdewamî li Selmayê dinerî, guhdariya giyanê wê yê acizbûyî dikir û pê re êş û jan

dikişandin ta ku haydar bûm ku dem sekinîbû û gerdûn êdî tine bû. Min êdî tenê herdu çavên wê yên mezin, ên ku bênavbir fedikirin min, didîtin û bi destê wê yê sar î recifok di yê xwe de dihesîm.

Gotinên Selmayê yên bi dengê nizm ez ji gêjiya min şiyar kirim: "Were, evîndarê min, em ji pêşeroja xwe ya têtirs bipeyivin ji berê ku ew bê. Aniha bavê min çûye dîtina wî mêrî yê ku dê ta mirinê bibe hevjinê min. Bavê min, ku Yezdan bi rêya wî jiyana da min, dê biçê dîtina wî mêrî yê ku dinyayê ta mirina min ji min re wek fermanîdar bijartiyê. Li navenda vî bajarî pîremêr, hevbendê ciwaniya min, dê bi wî xortî, yê ku ez ê di heyama salên pêş de pê re bim, re hevdîtinekê bike. Vê êvarê du malbat dê biryara roja zemawendê bidin. Çi bîskek sosret û bibandor! Hefteya borî di heman demê de, li binê vê daryasemînê Evînê cara yekem giyanê

min hemêzand, û di heman demê de Felekê jî li mala metran yekemîn peyva çîroka jiyana min nivîsî. Niha, dema ku bavê min û xwestiyê min roja zemawendê plan dikin, ez dibînim ku ruha te li nêzî min dilerize mîna balindeyek tînî yê li raserî avkaniyekê, ya ku marek birçî nobetiyê lê digire, baskên xwe dipirîne. Ax, ev çi êvarek gewre ye! Ê ax, têgihîna wê çi kûr e!"

Bi bihîstina van peyvan, ji min re wer xwiya bû mîna ku sîbera reş a bêhêvîtiyê xwe avêtibe ser evîna me û tê bikoşe ku wê di savatiya wê de bikuje, û min ew bersivand: "Ew balinde dê li

hindavî kaniyê bifire ta ku tîn wî bifetisîne yan jî ew bikeve hemêza mar û gorî wî bibe."

Lê Selmayê bersivand: "Na, evîndarê ber dilê min, ev bilbil dê jîndar bimîne û dê bistre ta tarîti bikeve ser erdê û bihar xelas bibe jî, ta dawiya dinyayê ew ê bimîne û bi abadînî bistre. Dengê wî qut nabe çimkî ew jiyanê tîne dilê min, baskên wî naşkên çimkî livên wî ewran ji ser dilê min radikin."

Dû re ez pistîm: "Selma, delala min, tîn dê wî bibetilîne; û tirs dê wî bikujîne."

Selmayê lezand û bi lêvên recifok bersivandim: "Tîna giyan ji meya bedenê şîrîntir û tirsê ruhê ji ewlekariya bedenê jê re dayî bibandortir e. Lê bibihîze, evîndarê min, bibihîze, îro ez li ber

qeraxa jiyaneke nû me ya ku tiştê jê nizanîm.  
Ez mîna kesek kor im a ku rêya xwe wisan  
dinase ku nahilingive. Ji ber dewlemendiya bavê  
xwe ez ketim bazarê kolefiroşan, û wî mêrî ez  
kirîme. Ez ne wî nas dikim û ne jî jê hez dikim  
lê ez ê fêrî hezkirina wî bibim, bi fermanên wî  
bikim, xizmetê jê re bikim û fêr bibim wî  
bextewar jî bikim. Ka jina belengaz dikare çî  
bide mêrê bihêz, ez ê bidim wî.  
Lê tu, evîndarê min, hê li nîva bedewiya jiyaneke  
yî. Tu dikarî li ser rêbaza berfireh a bi gulan  
rapêçandî ya jiyaneke bê û biçî. Azad î ku bi dilê  
xwe yê ji te re pêtalek ronahîdar re li dinyayê  
bigerî. Dikarî bi azadî biramî, bipeyivî û

bixebitî; dikarî navê xwe li rûyê jiyaneke binivîsî  
çimkî tu mêr î; dikarî mîna mîran bijî çimkî  
dewlemendiya bavê te tu ji bo firotin an kirîne  
nexistî bazarê kolefiroş û -kiran; dikarî bi keça  
te bi xwe bijartî re bizewicî û ji berî ku ew bê  
mala te, dikarî wê di dilê xwe de bijiyînî û dikarî  
bê şik baweriyê pê bînî."

Bîskekê bédengî bû û dû re Selmayê domand:  
"Ma divê jiyaneke me wisan ji hev vebiqetîne ku tu  
bibî mêrek xwedîşeref û ez jinek guhdar? Ma ji  
ber vê yekê ye ku gelî strana bilbil di kûratiya  
xwe de dadiqurtîne û ba belgên sorgulê  
vediqirîne, û pî dişewişin meqdedehê? Ma ew

hemû êvar bêşûd bûn ku me di hîveronê de li nik daryasemînê derbas kirin dema ku giyanên me dihelîn nav hev? Ma em gelekî bi lez firîn stêran û niha baskên me westîn, û ma niha em ê bikevin kend û kospan? An jî ma Evîn di xewê de bû dema ew hat cem me, û ma bi şiyarbûna xwe re ew qas qehirî ku biryar da me ceza bike? Yan jî ruhên me bakê sivik ê şevê kir bayek tund ê ku em peritandin û perçe-perçe kirin û avêtin kûratiya geliyê xweliyê? Em li dij regez û fermanan derneketin û me fêkiyê qedexekirî nexwar, îcar ev çi ye ku me ji vê biheştê derdixîne? Me ticaran hîlebazî û serîhildan nekirin, îcar çima em dinoqin dojahê? Na, na, ew bîsk, ên ku em digihandin hev, ji sedsalan bibandortir in, û roj, a ku ronahî da giyanên me, ji tarîşevê bihêztir e; û eger bahoz me li vê deryaya bofîn ji hev vebiqetîne, pêl dê me li perava aram bigihînin hev; û eger ev jiyan me

biruxîne, mirin dê me bi hev bigihîne. Ne dem û ne jî demsal dikarin dilê keçan biguherînin; tevî ku ew dil bi berdewamî diperitin jî, ew ticaran bi tamamî naruxin. Dilê keçan mîna zeviyekê ye ku bûye meydana cengê; ku dar bi reh û rîşên xwe ve ji erdê hatine hilkişandin, giya hatiye şewitandin û zinar ji xwînê sor in û hestî û kuloxên ser di erdê re hatine çikilandin, dîsan jî



zevî aram û bêdeng e çimkî bihar û payiz dê her  
bên û dîsan dest biavêjin kar û xebatê.

Û niha, evîndarê min, divê em çi bikin? Çawa  
em ji hev biqetin, û kengî em ê dîsan hevdu  
bibînin? Ma em vê evîne wek kesek xerîb  
bihesibînin ku êvarê li me bû mêvan û spêdeyê  
zû em hiştin? Yan jî em vê hestê wek bînahiyekê  
bihesibînin ku hat xewna me û bi şiyarbûna me  
re wenda bû?

Ma ev hefte bi tenê bi bîskek sermestiyê em  
xistibûn vê rewşê ku divê em jê şiyar bibin nav  
rastiya xwe? Serê xwe rabike û bihêle ez li te  
binerim; lêvên xwe vebike û bihêle ez dengê te  
bibihîzim. Ji min re biaxive! Ma piştî ku ev  
bahoz keştiya evîna me binoqîne jî ez ê li bîra te  
bim? Ma tu ê pistîna baskên min di bêdengiya  
şevê de jî bibihîzî? Ma tu ê pê bihesî ku giyanê  
min bi nearamî xwe li raserî te diqelizîne? Tu ê  
axîn û oxînên min bibihîzî? Tu ê bibîni ku sîbera  
min di nav siyên gewr û tarî de nêzî te dibe û di  
berbanga spêdeyê de wenda dibe? Ji min re  
bibêje, evîndarê min, yê ku tu tîrêjek efsûn î ji

bo çavên min, stranek şîrîn li ber guhên min û  
bask ji giyanê min re, tu ê bibî çi? Tu ê çi bikî?"  
Bi van gotinan dilê min helî, û min ew  
bersivand: "Tu bixwazî ez bibim çi, evîndara  
min, ez ê bibim ew."

Dû re wê got: "Ez dixwazim ka çawa helbestvan ji ramanên xwe yê nêrxem hez dikin, wisan tu jî min bievînî. Ez dixwazim wisan li bîra te bim ka çawa rêwî, yê ku rûyê xwe di ava lîçekê re dibîne dema ku avê jê vedixwe, û derengtir wê bi bîr tîne. Hêvî dikim ez wisan li bîra te bim ka çawa dayik zarokê xwe, yê ku ji berî dîtina roj û hetavê dimire, bi bîr tîne, û mîna padişayek diloan ê ku ji berî mihrevaniya wî bigihe girtî, ew dimire. Dixwazim ku tu hinekî li cem min bimînî û hêvîdar im ku tu ê bê û di tenêtiya bavê min de lê binerî çimkî ez ê ji nik wî biçim û jê xerîb bibim."

Min bersiv jê re da: "Te çi xwest, ez ê bikim, û ez ê giyanê xwe ji giyanê te re bikim perde, dilê xwe ji bedewiya te re bikim jîngeh û sîngê xwe ji xemên te re bikim goristan. Ez ji te hez dikim, Selma, mîna ku çawa zozan ji biharan hez dikin, û ez di te de dijîm mîna ku çawa gul di tîrêjên rojê de dijî. Ez navê te distrim mîna ku çawa gelî dengê çengên dêra gund vedide; guhdarê gotinên giyanê te me mîna ku çawa perav jî guhdarên çîrokên pêlan in. Ka çawa xerîb welatê xwe yê xoşewîst, mêrê birçî sifreya xwarina cejnê,  
padişayê  
hilweşandî  
biriqdariya

desthilatiya xwe û girtî jî rojên xwe yên azadiyê bi bîr tînin, tu ê wisan li bîra min bî. Ka genimçîn çawa pangeha tovê genimê xwe û şivan jî zozanên şên û rûbarên bedew bi bîr tînin, ez ê hertim te wisan bi bîr bînim."

Selmayê bi dilqutînî li peyvên min guhdarî kir û dû re got: "Sibê rastî dê bibe sîber û şiyarbûn jî dê bibe xew. Ma hemêzandina sîberê dê ji evîndar re bes be yan jî ew ê tîna xwe bi kaniya xewê bişkîne?"

Min bersiv da: "Sibê felek dê te bibe nav aramiya malbatîyê lê ew ê min bişîne nav cîhana şer û cengê. Tu ê biçî mala wî kesî yê ku felek jê re dilovantir bûye ku bedewî û dilpakiya te bexşandiyê lê ez ê jiyaneke têrjan û têtirs bijîm. Tu ê di deriyê jînê, ez ê di yê mirinê re bikevim hundur. Xelk ê ji te re mêvanperwer be lê tenê dê para min be lê ez ê peykelê evînê ava bikim û ta mirinê ayindariya wî bikim. Evîn tenak xemrevîna min e, û ez ê wê mîna avê vebixwim û mîna cilan li xwe bikim. Spêdeyan Evîn ê min ji xewê şiyar bike û min bibe mêrgên dûr, û nîvroyan ew ê min bibe ber sîbera daran ku ez ê bi balindeyan re xwe ji germiya tavê bispêrimê. Êvaran, ji berî rojavabûnê, ew ê bînvedanê bide min û stranên xatirxwaziya xwezayê yên ji bo zelaliyê bi min bide guhdarîkirin, û ew ê ewrên

sawêrî, yên ku li esmanan diseyirin, nîşanî min bide. Bi şevê Evîn ê min bihemêzîne, û ez ê di xewnên xwe de cîhana esmanî, jîngeha giyanên evîndar û helbestvanan, bibînim. Biharan ez ê bi

evînê re di gulbinefş û yasemînan de bimeşim, û ez ê çipên dawîn ên zivistanê ji kulîlkên sosinan vebixwim. Havînan em ê giya bikin balguhê xwe û herzêl jî dê doşeka me be, û dema em li stêran û heyvê dinerin, esmanê şîr dê lihêfa me be.

Payizan ez û Evîn, em ê biçin nav reza û li ber tirîzirviçînan rûbinin û em ê li wîşiyên tirî yên ji neqşên xwe yên zêrîn verûçandî binerin û di heman demê de balindeyên koçber dê li raserî me bifirin. Zivistanan em ê li ber argûnan rûbinin û çîrokan ji serdemên berê û serpêhatiyan ji welatên dûr bixwînin. Di xortaniya min de Evîn rêbera min; di navsereyîya min de zêrevana min; û di pîriya min de jî kêfxweşîya min e. Evîn, evîndara min Selma, dê ta dawîya jiyana min bi min re be, û piştî mirinê jî destê Yezdan dê me dîsan bigihîne hev."

Hemû ew gotin ji kûratiya dil dihatin mîna çirûskan ên ku ji nav agir diqirçîn û dû re di nav xweliyê de wenda dibûn. Selma wisan girî mîna ku çavên wê lêv bin ku pê bipeyive.

Ew kes, ên ku evînê bask nedaniyê, nikarin di ser ewran re bifirin daku wê cîhana efsûnkirî, ya ku giyanê min û yê Selmayê wê bîska bextewariya bextreş gihan hev, bibînin. Ew kes, ên ku Evînê ji xwe re wek hevrê nebijartine, dengê vexwendina Evînê nabihîzin. Ev çîrok ne ji bo wan e. Tevî ku ew ji van rûpelan fam bikin

jî, ew nikarin ji wan ramanên li vir bi lêv nekiri serwext bibin lê ma kesek heye ku ticaran çêj nekiriye qedeha meya evînê, û çî giyan heye ku bi sernermî li ber text û taca seraya wê ranewestiye ku binê wê dilê mêr û jinan û banê wê jî ji xewnên efsaneyî ye? Ma kîjan belga gulan heye ku spêdeyê ti çipikên xunavê nerijandiye ser; û ma çî rûbar heye ku herika xwe ji berî gihana deryayê wenda kiribe? Selmayê serê xwe ber bi esman de bilind kir û li stêrên esmanî, yê ku qepaxa esman dineqîşandin, nerî. Dû re wê destên xwe rakirin: çavên wê beliqîn û mezin bûn, û recifek ket lêvên wê. Min karî li ser rûyê wê yê spîçolkî nîşanên xemgînî, acizbûn, bêhêvîtî û jangiriyê bibînim. Paşî ew qîrî: "Xwedêyo, ma jinê çî kiriye ku dilê te hiştiye? Ma wê çî guneh kiriye ku hêjayî vê îşkencedanê be? Ma wê çî ziyan gihandiye kê ku bi abadînî cezaya bedenê lê bê kirin? Ax Xwedêyo, Tu bihêz î û ez lawaz im.

Çima dihêlî ku ez ewqas êş û janan bikişînim?  
Tu gewre û hemûkar î lê ez ne tiştêk im ji bilî  
afirandiyek netitişt, ê ku xwe li pêşberî text û  
taca Te dixuşîne. Te çima ez bi piyên xwe  
dewisandime? Tu bahozek har î lê ez bi tenê  
mîna tozê me; çima, Yazdanê min, çima te ez  
avêtime û virandime nav vê cîhana sar? Tu  
hêzdar î û ez nekar im; çima li dij min şer dikî?  
Tu hurmetkar û giramgir î û ez sehîker û  
têgihayî me; çima min diruxînî? Te jin bi evînê  
afirand, û êdî çima dixwazî wê bi evînê biruxînî?  
Bi destê xwe yê rastê Tu wê radikî û bi yê çepê

wê diavêjî kend û kospan, lê ew nizane çima?  
Te giyanê jiyane pifand devê wê û Tu tovê  
mirinê di dilê wê de diçînî. Tu rêbaza  
bextewariyê nîşanî wê didî lê wê didî ser rêya  
xeman; Te strana bextiyariyê di devê wê de  
çêkir lê paşî te lêvên wê bi xemgîniyê girê dan û  
zimanê wê bi janê zincîrand. Bi tiliyên xwe yê  
esrarengiz Tu birînên wê derman dikî, û destên  
xwe Tu tirsê janê li dor dilxweşiya wê dipêçînî?  
Tu kêfxweşî û aramiyê dixî nav nivîna wê lê li  
ber wê asteng û xefikan vedidî. Tu hestekê dixî  
dilê wê çimkî dilê Te dixwaze lê ew hest dibe  
sedema rûreşiyê. Tu bi xwesteka xwe bedewiya  
dahênan û afirandinê nîşanî wê didî lê evîna wê  
ya li hember bedewiyê jê re dibe birçîtiyek

xelayî. Tu wisan dikî ku ew jiyânê ji qedeha  
mirinê û mirinê ji îskana jiyânê binoşe. Tu wê bi  
ronikan pak dikî û jiyana wê bi hêsiyan re  
diherike û ji dest diçe. Ay Xwedêyo, Te çavên  
min bi evînê vekirine û bi evînê ew korandine jî.  
Te bi lêvên xwe ez maçandime û bi destê xwe  
yê tund jî ezab dame. Te di dilê min de sorgulek  
spî çandiye û danartiye lê li dor wê tan û  
çeperek striyan daçikandiye. Te ev bîska jiyana  
min bi giyanê xortekî ve girê daye lê jiyana min  
xistiye nav bedena mêrek nenas. Ax, alîkariya  
min bike, ax Xwedêyo, alîkariya min bike ji bo  
ku ez di vê berxwedanê de bihêz bim, alîkariya  
min bike daku ta mirina xwe qenc û bibawer  
bim. Bila niyeta te bi cî bê, ax Yezdanê pak."  
Bêdengiyê dom kir. Selmayê bi spîçolkî û  
belengazî li ber piyên xwe dinerî. Destên wê ji

ber westîn û betilînê xilwilîn, serê wê çemî, û ji  
min re wer dixwiya mîna ku bahozê çeçek ji  
darê şkandibe, jê vekiribe û dawêşandibe erdê ji  
bo ku li wir hişk bibe û bimire.

Min destê xwe avêt destê wê û ew maç kir lê  
dema ku tê koşîm ji bo ku wê aş bikim,  
pêwîstiya min bi xwe bi aşkirin û xemrevandinê  
hebû. Ez bêdeng bûm, li ser tengasiya em tê de  
diponijîm û min li quta dilê xwe guhdarî dikir.  
Kes ji me herduyan nedipeyivî.

Jana bêsinor bêdeng e, û loma em bêdeng  
rûniştibûn wek kevirbûyîyan mîna peykelên  
mermerî, yên ku erdhejê binxîz kirine. Kesek ji  
me nedixwest li ya/yê din guhdarî bike çimkî  
benên dilên me zirav û neqayim bûn, û  
nefeskişandinekê jî dikarîbû wan bipiçîne.  
Nîvşev bû û me dikarîbû nîvheyvê, ya ku ji pişt  
Çiyayê Sunin rabû, bibînin; heyv li nîva stêran  
bû, mîna rûyê mirov di tabûtê de ku bi ronahiya  
sel û bêhêz a şemal û mûman dor lê girtî. Û  
Libnan mîna mêrek pîr bû ku salan pişt a wî  
çemandiye û ku çavên wî, ango penageha  
bêxewiyê, li tarîtiyê dinerîn û bendewarên  
spêdeyê bûn mîna padişayekî yê ku li nav  
kavilên seraya xwe li ser bermayiyên textê xwe  
rûdine.

Çiya, dar û çem li gor serdem û demsalan xwe  
diguherînin mîna ku mirov jî bi pêzanîn û hestên  
xwe re xwe diguherînin. Spîndarek gewer, a ku

bi rojê dişibe bûkek bedew, bi şevê mîna  
peykelek dûmanê ye; kevirek bêyom mezin, ê  
ku piştî nîvro neliq e, bi şevê, dema ku doşeka  
wî erd û lihêfa wî esman e, dibe jar û belengaz;  
û rûbarokek, ê ku em dibînin ku spêdeyan  
dibirîqe û em dibîhîzin ku sirodên abadîniyê  
distre, dibe herika hêsiran û mîna zarokek  
dayika xwe wenda kirî dinale, û Libnan, a ku



hefteyekê berî niha, dema ku heyv çarderojî bû û giyanên me bextewar bûn, ewqas bihagiran dixwiya, vê şevê xemgîn û bêkes e.

Em rabûn ser piyan û me xatir ji hev xwest lê evîn û bêhêvîti mîna du sawêran di navbera me de bûn, yekê baskên xwe belav dikirin daku me bisitirîne lê yan din ji bo ku me biruxîne, yek digirî lê ya din bi dilreşî dikenî.

Dema ku min destê Selmayê girt û ew rakir ber lêvên xwe, ew nêzî min bû û eniya min maçand, dû re ew xilwilî ser rûnişteka darîn. Wê çavên xwe neqandin û bi dengnizmî pistî: "Xwedêyo, li min were rehmê û baskên min ên şkestî bicebirîne."

Dema ku min Selma bi tena serê xwe li nav bexçe hişt û derketim, ji min re wer dixwiya ku ebayek stûr hestên min niximandibûn, mîna deryaçeyekê ya ku mij radipêçe.

Bedewiya daran, hîveron, bêdengiya kûr, hemû ji min re kirêt û erjeng dixwiyan. Ronahiya rastîn, a ku bedewî û xweşikiya gerdûnê nîşanî

min dida, bû gurzek agir ê ku dilê min di nav gurriya xwe de qiçand; û muzîka abadîniyê, ya ku min bi şanazî lê guhdarî dikir, bû qerebalixek ji orîna şêran jî bitirstir.

Ez hatim odeya xwe, û mîna balindeyek birîndar, ê ku nêçîrvan pê ketiye, helişîm ser

nivînên xwe û min gotina Selmayê dubare kir:  
"Xwedêyo, li min were rehmê û baskên min ên  
şkestî bicebirîne."

## LI PÊŞBERÎ TEXTÊ MIRINÊ

Di rojên me de zewac lîstika qeşmeran e û ji  
aliyê mêran û dêbavan de tê bicîanîn. Li  
pirraniya welatan mêr bi ser dikevin û dêbavên  
wan di lîstikê de têk diçin. Lê jin mîna pilî û  
pirtûyên bazirganî tê hesibandin û malbatek wê  
difiroşe û dide ya din. Demek tê ku bedewiya  
wê wenda dibe û ew jî dibe mîna pertalek kevn  
malê ya ku li quncikên tarî bêkes tê hiştin.  
Şaristaniya modern jin hinekî zanatir kirine lê ji  
ber xwestekên mêr derd û kulên wê zêde bûne.  
Jina do bermaliya bextewar lê jina îro hezkiriya  
bextreş e. Berê ew wek çavkor di ronahiyê de  
digerî lê niha ew bi çavên bel di nav tarîtiyê de  
dimeşe. Ew di nezaniya xwe de bedew, di  
cahiliya xwe de xêrxwaz û di lawaziya xwe de  
bihêz bû. Niha ew bi şîretgeriya xwe bûye  
dilreş û bi zanîna xwe jî bûye giyankor û bêdil.  
Ma gelo dê ticaran ew roj bê ku bedewî û  
şarezayî, jêhatîti û xêrxwazî, lawaziya bedenî û  
xurtiya giyanî di jinê de hev bigirin?  
Ez ji wan kesan im ên ku bawer dikin ku  
pêşketina giyanî armanca jiyana mirov e lê  
bidestxistina temamî û bêkêmasîtiyê pêvajoyek

hêdî û bijan e. Eger jin xwe di warekî de pêş  
bixe û di yek din de li paş bimîne, sedema vê

yekê ew e ku rêya wê ya asê ber bi gupika çiya  
de ji êrîşên dizan û kuncên guran ne maliştî ye.  
Ev nifşê sosret di navbeyna xewê û şiyarbûnê de  
dijî. Di destên wî de erda paşerojê û tovê  
pêşerojê heye. Lê dîsan jî em ji her bajarekê  
jinekê, ya ku sembola ayendeyê ye, dibînin.  
Li bajarê Bêrûtê Selma Karamy remza pêşeroja  
jina Rojhilatî ye lê ew jî - mîna pirraniya wan  
kesên ji hevdemiyên xwe pêşketîtir dijîn - gorî  
hevdema xwe bû; û mîna gula ji destikê xwe  
piçandî û avêtî ber herika çem, ew bi karwanê  
hêviyên dilşkestî re dimeşî.

Mensor Bey Galib û Selma Karamy bi hev re  
zewicîn û mîna hemû bêrûtiyên dewlemend î  
qedirbilind ew jî di xaniyek bedew ve li Ras  
Beyrouthê diman. Faris Efendî Karamy di nav  
baxçe û darfêkiyên xwe de li mala xwe ya varê  
mabû mîna şivanek bi tenê ku li ber terşê xwe  
dimîne.

Rojên piştî zemawendê û şevên dilxweşiyê  
derbas bûn lê şîrînmeh bû kaniya bîranînên  
xeman mîna ku çawa ji ber cengan jî serkulox û  
hestiyên hişkbûyî li meydana cengê dimînin.  
Xemla zemawendên Rojhilatî dikarin dilê keç û  
xortên ciwan geş bikin lê piştî dibe ku ew mîna

destaran bikevin binê av û behrê. Şahiya wan mîna şop û şûnpiyên li ser xîz û qûm in ku bi tenê ta hatina pêlan xwe digirin.

Bihar çû, herwiha havîn û payiz jî lê evîna min a li hember Selmayê roj bi roj zêdetir bû, û ew bû şibî îbadetkirin û ayindariyek bêdeng, û hestek mîna ya ku sêwiyan li hember dayika xwe ya biheştî heye. Bêrîkirina min bûbû xemgîniyek kor a ku ji bilî xwe nedikarî tiştekî bibîne, û bûbû janek a hêsiir ji çavên min digivaştin, bûbû matbûnek a ku xwîn ji dilê min dimêt, û encama axînen vê hestê afirandî bû nimêj û lavayek a ku hêviya dilşahiye ji Selmayê û şûyê wê û herwiha jî aramî ji bavê wê re dixwestin.

Hêvî û lavayên min bêşûd bûn çimkî bextreşiya Selmayê nexweşiyek hundurîn bû ku bi tenê mirinê dikarîbû sax bike.

Mensor Bey zelamek bû ku dikarîbû bi asanî her xweşî û lezeta jiyane bi dest bixe lê dîsan jî ew nerazî û nêçîrxwaz bû. Piştî zewicîna bi Selmayê re wî bavê wê di tenêtiyê de hişt û xwest ku ew zû bimire daku maliyeta wî ya mayî jî hilbifirîne.

Mesnor Bey bi xwezaya xwe dişibî mamê xwe; tenak cudatiya wan ew bû ku metran çi bixwesta, bi dizîkî, bi saya cibeyê xwe yê dêrê û bi xaça zêrîn a li bersînga wî bi dest dixist lê

biraziyê wî her tişt bi eşkereyî fikir. Metran spêdeyan diçû dêrê û dawiya roja xwe bi xapandina jinebî, sêwî û mirovên cahil û xîfandina pereyên wan ve derbas fikir. Mensor Bey dema xwe bi têkoşîna xwetêkirina seksualî ve diborand. Rojên yekşeman Bulos Galib waz

ji încîlê didan lê rojên din ew di karên xwe de li pey wan wazan nediçû lê di fêlbaziya siyaseta qirêj a navçeyê de beşdar bû. Ê bi saya qedir û qîmeta mamê xwe Mensor Bey karê xwe kiribû peydakirina bandora siyasî ji bo wan kesan ên ku dikarîbûn xelat û bertîlek baş jê bidin.

Metran Bulos Galib dizek bû ku bi şevê xwe dixuşand lê biraziyê wî xapînokek bû ku ji xwe çûyî li nîva rojê karê xwe fikir. Lê tevî vê hemû yekê jî, gelên Rojhilatî bi van gur û serjêkeran, ên ku bi hesûdiya xwe welatê xwe diruxînin û xizm û lêzimên xwe bi destê xwe yê asinîn diperçiqînin, bawer dikin.

Çima van rûpelan bi wan peyvan, ên ku basa xapînerên gelên hejar û tepeser dadigirim, madem ku ez dikarim van rûpelan ji çîroka jiyana keçek bextreş, a ku dilê wê şkestiye, re bimezêfim? Çima ez ronik û hêsiran ji bo gelên zorlêkirî diwerînim, ma ne baştir bû ku min ew tev ji bo bîranîna keçek reben, a ku diranên mirinê jiyana wê piçand, bihêlim.

Lê, xwendevanên min ên delal, ma bi we jî ne wisan e ku keçek wilo dikare bi wan gelan, ên ku ji aliyê desthilatdar û metranan de tên perçiqandin, re bê berhevdan û miqayesekirin? Ma hûn bawer nakin ku evîna pûçkirî, ya ku keçê dibe gorê, mîna wê bêhêvîtiyê ye ya ku dilê rûniştvanên welat digire? Keç jî ji gel re mîna ronahî ji fanosê re ye. Ma eger gaz di fanosê de kêm be, ronahî jî bêhêz nabe?

Payiz derbas bû, ba pel û belgên zer î beyî ji daran firandin û rê ji zivistanê re vekir û zivistan jî bi qîrîn û girîn hat. Hê jî min li Bêrûtê hevrêyek tine bû ku xewn û xeyalên min biparastina daku van xeyalan giyanê min pêşî bilind bikira ber esmanan û paşî ew di kûratiya bersînga erdê de binax bikira.

Giyanê xemgîn di tenêtiyê de tenahî û aramiyê peyda dike. Ew ji mirovan direve mîna xezala birîndar a ku ji şivan direve û xwe dispêre şkeftê ta ku sax dibe yan jî dimire.

Rojekê min bihîst ku Faris Efendî nesax e. Ez ji xanîkê xwe derketim û çûm mala wî. Vê carê min rêyek din ji xwe re bijart, di nav daristanoka zeytûnan re meşîm û min xwe neda ser rêya serekî ya ku derwaze bi xirxalên xwe yê xilingende tê re tên û diçin.

Dema ku giham mala Faris Efendî, min ew wek

bêhêz û spîçolkî di nav nivînan de dît. Herdu çavên wî tebiqîbûn kûratiyê mîna du geliyên reş î kûr ên ku sîberên janê belayên xwe jê venakin. Bişir û bişkurr, a hertim li ser lêvên wî bû, bi êş û jana mirinê hatibû fetisandin; û destên wî yê dilovaniyê bûbûn mîna du çeqên rût ên daran ku ji berî destpêkirina barov û bahozan direcifin. Dema ku ez nêzî wî bûm û min halê wî pirsî, wî berê rûyê xwe yê bêrengbûyî da min, lêvên wî yê lerizok bişirîn û wî bi dengê bêhêz got: "Here - lawê min, here odeya bi rex vê ve,

xemên Selmayê vebirevîne û wê bîne li cem min bide rûniştin."

Ez çûm wê odeyê û min dît ku Selma li ser xalîçeyê xwe pal dabû, destên wê li ber serê wê bûn û serê xwe daheşandibû nav balguh ji bo ku bavê wê giriyê wê nebihîze. Ez bi pêngavên biseqbêr nêzî wê bûm û min navê wê pistand lê ew ji pistê pêtir wek axîne ji devê min derket. Wê bi şermokî xwe livand mîna ku ji xewnek erjeng hatibe şiyarkirin, rabû ser xwe û bi çavên rengşûşeyî li min nerî û guman dikir ka ez sawêr û xeyalet an jî afirandiyek jîndar bûm. Bîskeke bêdengî bû û wê yekê em bi baskên bîranînan vegerandin wê demê gava ku em herdu bi meya evîne sermest bûbûn. Paşî Selmayê ronikên xwe paqij kirin û got: "Tu dibînî ku demê em çawa

guherandine! Tu dibînî ku çawa demê rêya jiyana me guherandiye û em gihandine nav van kaviên xopan? Li vir biharê em bi bendên evîne bi hev re girê dan, û li vir wê em anîne ber tac û textê mirinê jî. Ax, çi qas bedew bû ew bihar û çi qas nexweş e ev zivistan!"

Piştî van gotinan wê destên xwe dan ber rûyê xwe mîna ku xwe ji sîbera serdemên raborî, ku li pêşiya wê bûn, biparêze. Min destê xwe danî ser serê wê û got: "Were, Selma, were em li hember hilbûna bahozê asêgehek bihêz bin. Em mîna şervanên biste bin li pêşberî dijmin û em dijberî çekên wan bin. Eger em bimirin, em ê şehîd bin û eger em bi ser bikevin, em ê egîd bin. Ji revîn û bêdengiyê cewertir e ku em pêrgî asteng û

belayan bîn. Were, Selma, em bi serberzî li ser vê rêya kevirîn bimeşin, çavên xwe bera rojê bidin daku em serkulox û maran di nav kevir striyan de nexwe bêhed pê hebe?"

Selma rabû ser piyan, serê wê hinekî xwar bû, û çû odeya din û li rex nivîna bavê xwe rûnişt. Wê bi zorê bişirek da ser lêvên xwe û li ser rûyê xwe da xwiyaandin ku qaşo baldirêj e, û bavê wê jî hewl da ku nîşan bide ku saxtir û bihêztir bûye; lê herdu jî, hem bav û hem jî keç, ji xemgîniya hevdu agadar bûn û wan oxînen hevdu yê bêdeng dibihîstin. Ew mîna du hêzên şibî hev



bûn ku hevdu dihelandin. Dilê bav ji ber pêbaweriya keçê helî. Ew mîna du giyanên bêgune bûn, yek li ber koç û çûnê bû û ya din li ber jankişandinê dê bimaya; herduyan hem di evîn û hem jî di mirinê de hevdu dihemêzandin; û ez di navbera wan de bûm û dilê min nearam bû. Em sê mirov bûn ku destên felekê em li hev civandibûn û perçiqandibûn, pîremêr mîna xaniyekî bû ku herikê bi xwe re birî, keça ciwan mîna sosina devê xweşberr ê şalokê piçandî û mêrê ciwan mîna şitilek berfê di bin xwe ve çemandî.bînin. Eger tirs be di nîva rêyê de bibizdîne, em ê bi tenê dengê şevê, yê ku qerf û henekên xwe bi me dike, bibihîzin lê eger em bê tirs xwe bigihînin gupika çiya, em dikarin tevî sirodên şahî û şehyanên giyanên esmanî bibin. Bisteyiyê bide dilê xwe, Selma, hêsirên xwe paqij bike û xemgîniyê ji ser rûyê xwe biavêje. Rabe, em rûnin ber doşeka bavê te çimkî jiyana

wî di destên te de ye û bi tenê bişira te dikare wî sax bike.

Wê bi hevaltî û dilnermî li min nerî û got: "Tu ji min xweragiriyê dixwazî lê pêwîstiya te bi xwe pê heye. Ma kesek birçî nanê xwe dide birçiyek din? Ma yek nesax derman dide nesaxek din eger pêwîstiya wî bi xwe gelekî bi derman hebe. Faris Efendî hêdîka xwe lebitand û destê xwe yê

bêhêz raberî Selmayê kir, û bi dengê nerm û ezîzane got: "Destê min bigire, delala min." Selmayê destê wî girt û paşî wî got: "Ez têra xwe jîme û min çêj û lezet ji fêkiyê demsalên jiyane dîtîye. Ez bi aramî pêrgî hemû qonaxên wê hatime. Di sêsalîya te de dayika te wefat kir, û tu wek gencîneyek bihagiran di hemêza min de hiştî. Min mezinbûna te dît û rûyê te dişibî yê diya te mîna ku çawa stêr di avlîçan re diteyisîn. Xweza, jîrî û bedeniya te, ta şeweyê axivîn û mîmîkên te jî, dişibîn ên dayika te. Li vê dinyayê tu tenak xemrevîniya min bûyî çimkî tu di her tevger û peyva xwe de wêneyê dayika xwe bûyî.

Niha ez pîr bûme, û tenak arambûngeha min li bin baskên mihrevan ên mirinê de ye. Bi wê yekê xemrevîn bibe ku ez ew qas jîm ku min dît va ye tu bûyî jin. Bextewar be çimkî piştî jiyana xwe ez ê di te de bijîm. Ferq nake ez îro, sibê yan jî dusibê bimirim çimkî rojên me her dê mîna pelên daran li payizan wenda bibin. Bîska mirina min nêz dibe, û giyanê min dixwaze xwe bigihîne yê diya te."

Bav ev gotin bi şîrînî û dilevînî gotin, rûyê wî ron bû. Paşî wî destê xwe xişand bin balguh û wêneyek biçûk î bi milbendê zêrîn derxist derê.

Wî li wêneyê biçûk nerî û bangî Selmayê kir:  
"Were, Selma, were û di vî wêneyî de li dayika  
xwe binere."

Selmayê ronikên xwe paqijandin û di dema  
lênerîna wêne de ew bênavbirr maçand û qîrî:  
"Ax, diya min a ezîz û delal!" Dû re wê lêvên  
xwe yên recifok danîn ser wêne, mîna ku  
xwestibe giyanê xwe birijîne nav wî wêneyî.  
Bedewtirîn peyv li ser lêvên mirovatiyê  
"Dayik", û bedewtirîn gotin jî "Diya min" e. Ew  
tijî hêvî û evîn e, ew gotinek nerm û hevalî ye  
ku ji kûratiya dil derdikeve. Dayik her tişt e - ew  
di xemgîniyê de xemrevîn, di bêhêvîtiyê de hêvî  
û di lawaziyê de hêza me ye. Ew serekaniya  
evîn, berketin, destyarî û bexşandinê ye. Ew kes,  
a/ê ku diya xwe ji dest bide, giyanê pak ê  
ewparêz wenda dike.

Di xweza û sirûştê de her tişt nîşana dayikê ye.  
Roj dayika erdê ye ku zad û xwarinê ji germiya  
xwe didiyê: ew ticaran gerdûnê bi şevê bi tenê  
nahêle ta ku wê bi stranên deryayê û sirodên  
balinde û rûbaran nenivîne. Ê ev erd jî dayika  
dar û gulan e. Ew wan diwelidîne, xweyî dike û  
ji xwe vediqetîne. Gul û dar jî dibin dayikên  
fêkî û tovên biwec. Ê dayik, ango remz û

sembola jiyanê, giyanek abadîn a tijî bedewî û  
evînê ye.

Selma Karamy ticaran diya xwe nenasîbû çimkî ew hê di zaroktiya Selmayê de miribû lê dema Selmayê wêneyê diya xwe dît, qîrî: "Ax dayê!" Gotina dayik di dilê me de ye, û hem di bîskên bextiyarî û hem jî di yên xemgîniyê de ew tê ser lêvên me mîna ku bîna biheştîn ji dilê sorgulê derdikeve û hem tevlî rojên sayî û hem jî têkilî yên ewrîn dibe.

Selmayê li wêneyê diya xwe nerî û bînavbirr ew maçand ta ku şewîşî erdê rex nivînên bavê xwe. Bavê wê destê xwe danî ser serê wê û jê re got: "Keça min, min wêneyê kaxezî yê diya te nîşanî te daye. Niha guh bide min û gotina wê bibihîze."

Selmayê mîna çivîkekê, ya ku di hêlîna xwe de şipîna çeng û baskên maka xwe dibihîze, serê xwe bilind kir, û bi bendewarî li wî nerî.

Faris Efendî kerem kir: "Dema ku bavê diya te wefat kir, tu berşîr bûyî; ew ji ber mirina bavê xwe dinalî û digirî lê awezmend û baldirêj bû. Piştî behî û taziyan ew di vê odeyê ve li rex min li ser piyan bû, destê min girt û got: 'Faris, va ye, bavê min çû ber dilovaniya xwe, û tenak xemrevîniya min li ser rûyê dinyayê tu yî. Hestên dil mîna çeqên darselwiyê şax dane, ew janê dikişîne lê namire. Ew hemû hêza xwe dide

çeqek nû ji bo ku ew çeq şên û mezin bibe û

ciyê yek hişkbûyî bigire.' Dayika te, dema ku bavê wê wefat kir, ev yek got, gava ku mirin bedena min bibe arambûngeha wê û giyanê min jî bispêre Yezdan, divê tu jî heman gotinan bibêjî.

Selmayê ew bi çavên hêsirbar û dilê şkestî bersivand: "Dema ku bavê diya min ji destî çû, te şûna wî girt; lê eger tu çûyî, kî dê bê ciyê te? Diya min mêrek bibawer û dilvîn hebû ku çavê xwe bidiyê; keça wê ya biçûk jê re bû xemrevînî, lê eger tu jî êdî nemayî, kî dê ji min re xemrevîn be? Tu ji min re hem dayik û hem bav û hem jî hevreyê ciwaniya min bûyî."

Piştî van gotinan Selma zivirî û li min nerî, destê xwe avêt pistoka min û ji bavê xwe re got: "Piştî mirina te ev tenak hevalê min e lê ew ê çawa bikare xemên min birevîne madem ku ew bi xwe di bin barê êş û janan de ye? Dilê şkestî dê çawa bikare xemrevîniyê ji giyanê dilsarbûyî peyda bike? Xemgîniya xizm û lêziman nikare keça xembar aş bike û balindeyê baskîkestî jî nikare bifire. Ew hevalê giyanê min e lê min hê ji niha barek giran ê xeman daniye ser milên wî û çavên wî bi hêsiyan ew qas tarî kirine ku ew êdî ji bilî xeman tiştê nabîne. Ew ji min re birayek e ku ez bi dilnêrmî jê hez dikim lê dîsan jî ew mîna hemû birayan e ku kul û derdên min para wan in jî û ew jî bi min re ronikan diwerînin lê ev hemû

yek bi tenê xemgîniya min zêdetir dike û dilê min dişewitîne."

Gotinên Selmayê dilê min birîndar kir, û ji min re wer dixwiya ku min ê hew bikariya li ber xwe bidaya û tehemil bikira. Bavê wê bi dilek giran î betilî lê guhdarî dikir û, mîna çirûska lempeyê li ber ba, direcifî. Dû re wî destê xwe raber kir û got: "Keça min, bihêle ez bi aramî biçim ser rêya xwe. Min şifşeyên vê rekeyê şkandine; bihêle ez bifirim û min neastengîne çimkî dayika te bangî min dike. Esmen zelal, derya aram û belem jî ji bo birêketinê amade ye: wê giro neke. Bihêle bila bedena min jî bi wan ên bînvedayî re bîna xwe bide; bihêle xewa min xelas bibe û giyanê min li berbanga spêdeyê şiyar bibe; bila giyanê te giyanê min bihemêzîne û maça hêviyê bide min; bila hêsirên xemgîniyê li ser bedena min neyên werandin daku xwarina gul û giyayan neherime. Ronikan newerîne ser destê min çimkî dibe ku strî ji wan li ser gora min şên bibin. Pêşdarî û teswîra mirinê li ser eniya min neke daku ba di ber min re derbas bibe û toza hestiyên min bibe mêrg û çîmenên hêşîn... Di jiyana xwe de min gelekî ji te hez kir, keça min, û dema ez bimirim jî, ez ê her ji te hez bikim, û giyanê min tê herdem bi te re be, te bisitirîne û biparêze."

Dû re Faris Efendî bi çavên nîv-neqandî li min nerî: "Lawê min, ka çawa bavê te ji min re xweşheval bû, tu jî ji Selmayê re xweşheval be. Ji wê re penadar be û wek hevaleyek qenc li hawara wê were û nehêle ew xemgîn bibe çimkî xemgînbûna ji ber miriyan gune û ne baş e.

Çîrok û serpehatiyên dilhebîn jê re bibêje û stranên li ser xweşikiya jiyane jê re bistre daku xema xwe vebirevîne. Silavên min bigihîne bavê xwe; jê bixwaze ku bila ji te re basa xortaniya min û xwe bike û jê re diyar bike ku min di şikilê kurê wî de ta bîska dawîn a jiyana xwe jê hez kir."

Bîskekê bêdengî hukumran bû, û min karî spîçolkîtiya mirinê li ser rûyê wî bibînim. Paşî wî çavên xwe vekirin û pistî: "Bang nekin nojdar û bijîşkan çimkî ew ê bi dermanên xwe bi tenê cezayê min li vê girtîgehê dirêjtir bikin. Rojên koletiyê li pey mane û giyanê min xwe dide ber azadiya esmanî. Ê ti qeşe û metranan jî bang nekin ber serê min çimkî eger ez gunekar bim, duayên wî min ji agir nafilitînin û ne jî rêwîtiya min ber bi biheştê de dilezînin tevî ku eger ez bêgune jî bim. Îradeya mirov nikare îradeya Yezdan biguherîne mîna ku çawa îradeya stêrnasan jî nikare gera stêran biguherîne. Lê piştî mirina min, qeşe û nojdar çî

dixwazin, bihêlin bila bikin çimkî keştiya min bê rawest dê rêwîtiya xwe bidomîne ta ku bigihe bineciyê xwe."

Li nîvşevê Faris Efendî dawîn car çavên xwe yên westiyayî vekirin û ew bera Selmaya li ber nivîna wî li ser çokan dan. Ew tê koşî ku bipeyive lê nikarî çimkî mirinê dengê wî fetisandibû; lê dawîya dawîn wî karî bibêje: "Şev xelas bûye... Ax, Selma... Ax... Ax

Selma..." Dû re serê wî çemî, rûyê wî spî bû, û dema ku cara dawîn nefesa xwe berda, min bişir li ser lêvên wî sihirand.

Selmayê destê xwe bi destê bavê xwe ve anî û bir. Yê bavê wê sar bû. Paşî wê serê xwe rakir û li rûyê wî nerî. Perdeya mirinê rû niximandibû. Selma ew qas bi mirina wî helişbû ku ne dikarî bigirî, ne binale ta ne bilive jî. Bîskekê wê wek peykelekî li bavê xwe nerî; dû re xwe çokand ta ku eniya wê ji erdê girt, û got: "Xwedêyo, li min were rehmê û baskên min ên şkestî sax bike." Faris Efendî Karamy mir; Abadîniyê giyanê wî girt hemêza xwe, û bedena wî bû ax. Mensor Bey Galib bû xwediyê maliyeta wî, û Selma jî bû girtiya jiyanê, jiyanek tijî xem û bêhêvîtiyê. Ez ketim nav xem û ponijan. Şev û rojan ez diqewirandim mîna ku çawa qertal nêçîrkiriyê xwe vediçirîne. Gelek caran ez tê koşîm ku bi



lêkolîna pirtûk û nivîsên nifşên raborî xemgîniya xwe ji bîr ve bikim lê ew jî mîna wê yekê bû ku mirov hewl bide agir bi gazê bitemirîne. Pirtûka Eyûb pêxember ji Zeborê pêtir bala min dikişand, û gazinbendên Jeremî ji kilamên Silêman bi min xweştir dihatin. Hamlet ji şanoyên din ên nivîskarên Rojava zêdetir li ber dilê min bû. Bêhêvîtiya bi vî şêweyî dîtbariya me diniquisîne û guhên me digire. Em ji bilî sawêrên mirinê nikarin tişteke din bibînin û xeynî

qutên lezbûyî yên dilê xwe nikarin tişteke din bibihîzin.

## DI NAVBERA MESÎH Î ÎŞTARÊ

DE

Li nav bexçe û girikan, ên ku Bêrûtê bi Libnanê re girê didin, îbadetgehek biçûk î gelekî kevnar di nav zinaran re heye û bi darzeytûn, -behîv û -biyan hatiye dorpeçandin. Tevî ku ev ayîngeh ne gelekî dûr e jî, li dema vê çîrokê bi tenê kêmkes, ên ku bermayiyên pîroz bala wan dikişand, çûbûn ew dîtibû. Ew jî ji wan bêhejmar ciyên balkêş e ku li Libnanê veşartî ne û hatine jibîrkin. Ji ber varêbûna xwe ew bûye penageha lavakeran û pîrozgeha evîndaran e. Dema ku mirov dikeve hundurê vê ayîngehê, wêneyek kevnar ê fênîkî, yê ku li ser zinar

hatiye necirandin û Îştarê ango xwedaya  
evîndarî û bedewiyê nîşan dide, li ser dîwarê  
rojhilat dikare bê dîtîn. Îştar li ser textê xwe  
rûniştî ye, heft zeriyan rûs û çîplaq li dor wê ne  
û her yek ji wan bi rawestek ji yê ên din cuda li  
ser piyan e. Di destê yekê de pêtalek; ya duyem  
gîtarek; a sêyem dermanê buxurê; ya çarem  
meyqedehek; a pêncem çeqek sorgulê; ya şeşem  
çelengek ji dara qaçê, ya heftem tîr û kevan  
heye; û hemû bi hurmetgirî li Îştarê dinerin.

Li ser dîwarê din wêneyek din, ji yê yekem  
moderntir, heye û ew Mesîhê çarmixandî nîşan  
dide, û li rex wî diya wî ya xembar û Maria  
Magdalena û du jinên din ên çavgirî li ser lingan  
in. Ji vî wêneyê bîzansî dikare bê xwiyandin ku  
ew li sedsala pazdehan an şazdehan hatiye  
necirandin.

Li dîwarê aliyê rojavayê du deriyên gilover  
hene, tîrêjên tavê di wan re dikevin ayîngehê, bi  
wêneyan dikevin û wisan nîşan didin mîna ku  
ew wêne bi rengên zêrîn hatibin boyaxandin. Li  
nava ayîngehê kevirek çargoşeyî yê ji mermer  
heye û li aliyên wî neqşên kevnar hene lê zarzor  
ew dikarin ji ber lewitên hişkbûyî yê xwînê bîn  
dîtîn, û ev lewit jî nîşanên wê yekê ne ku  
mirovên berê li vir gorî û qurban li ser vî kevirî  
didan û giyayên derman, mey û zeyt pê de

dirêtin.

Ti tiştekek di vê ayîngeha biçûk ve tine ye ji bilî aştî û tenayiya kûr a ku nepen û nihînên vê xwedayê nîşan mirov dide û basa nifşên borî û dîroka olan dike. Ev core bînayî helbestvan ji cîhana lê dijî dûr dixê û fîlozof dide bawerandin ku mirov wek oldar welidîne; wan bêriya tişteki kir lê nikarî xwe bigihîninê loma wan ev sembol nîgarandin ku nihînên wan ên veşartî û hêviyên wan ên jîn û mirinê tînin ber çav.

Li wê ayîngeha nenas min her mehê carekê Selma didît û min bi temaşekirina wêneyên sosret, ponijîna Mesîhê çarmixandî û ramîna

wan jin û mêrên ciwan ên fênîkî, yê ku ji bedewiyê dijiyan, bedewî dievîand û ayindariya bedewiya di Îştare de dikir, pêtal li pêşberî wêneyê wê dikizirandin, gulav li textê wê direşandin, li ser wan mirovan, ên ku bi tenê şopa meşa wan ber bi Rûyê Abadîniyê de mabû diponijîm... ta ku min bi saetan dem bi Selmayê re li wir derbas dikir.

Gelekî bijan e ku ez bîranînên wan bîskan bînim ziman dema ku min Selma didît - ew bîskên esmanî bûn ku tijî jan, bextewarî, xemgînî, hêvî û bêhêvîti bûn.

Me bi dizîkî hevdu li wê ayîngeha kevnar didît, rojên xwe yê hevbeş bi bîr dianîn, em ji rojên

xwe yê hevdemî dipeyvîn, ji pêşerojê ditirsîn û hêdî hêdî me nihînên di kûratiyên dilên me de veşartî jî deranîn, em ji ber bextreşî û eziyeta em tê de xembar bûn û em tê dikoşîn ku bi hêvî û xwestekên aşopî xemên hevdu vebirevînin.

Carinan em aş dibûn, me hêsirên xwe dipaqijandin û em dibişirîn, me ji bilî evîne her tişt ji bîra xwe dibir; me hevdu dihemêzand ta ku dilên me aram dibûn; paşî Selmayê lêva xwe ya bêgune danî ser eniya min û dilê min ji hal bir; dema ku wê gerdena xwe ya qerefilî çemand, min bersiva maça wê da û gep û alekên wê yê tenik mîna tîrêjên tavê li berbanga spêdeyê geşe-sor bûn. Di bêdengiyê de me li dûr li qeraxa esman dinerî dema ku rojê bi avabûna xwe re ewr bi tîrêjên pirteqalî rengandin.

Suhbeta me di çerçeveya evîne de bisînor nebû; carinan em li ser bûyerên rojîn dipeyvîn û me helwesta xwe ji hev re diyar dikir. Selma carinan li ser rewşa jinê di civakê de û li ser wê bandorê, ya ku ji aliyê nifşên raborî ketibû xwezaya wê, ji pêwendiyên jin û mêr, ji nesaxiya giyanî û xopanbûna exlaqî, yê ku li ser serê jiyana jin-mêrî gef bûn, diaxivî. Tê bîra min ku wê digot: "Helbestvan û nivîskar tê dikoşin ku jina rastîn teswîr bidin lê hê niha jî wan nihînên di dilê jinê de veşartî fam nekirine çimkî ew bi tenê perdeya

seksuelî ya li wê pêçandî dibînin û loma bi tenê rûyê wê yê bi ser ve dibînin; ew wê di mezinbîna bi nefretê niximandî re dibînin loma di wê de ji bilî lawazî û sernermiyê pêtir tiştê nabînin."

Cara din wê tiliya xwe ber bi nîgarên li dîwarên ayîngehê ve da û got: "Di dilê vî zinarî re du sembol hene ku kûrtirîn hebûna jinê pêşdarî û teswîr didin, daxwazên dilê wê dixin ber çavan, nihînen di kûratiya giyanê wê de diyar dikin - ku di navbera evîn û xemgîniyê, di navbera diltenikî û qurbanîyê, di navbera Îştara rûniştî û Meryema li ber xaçê rawestî de digerin. Divê bêguman bê gotin ku mêr ji xwe re şan û şerefê dikire lê jin mecbûr dibe ku bihayê wan bide." Ji bilî Yezdan û refa balindeyan, a ku li raserî ayîngehê difirî, kesekî hay ji hevdîtina min û Selmayê tine bû. Selma bi derwazeyên xwe dihat ciyekî ku navê wî Paşa Park bû û ji wir bi

piyan dihat ayîngehê ya ku ez bi nearamî lê bendewar bûm.

Em ji awirên hevdu aciz nedibûn û wijdana me jî em nedieyibandin; giyan, ê ku bi agir hatiye pakandin û bi hêsiran hatiye şûştin, di ser wê yekê re ye ku mirov bi eyb û bêşerefiyê dinavînin; ew ji wan zagonên koletiyê û kevneşopiyan, ên ku li dij hestên dilê mirov in,

azad e. Giyanê bi vî tehrî dikare bi serberzî, bê ku eyb û şerm bike, li pêşberî textê Yezdan li ser piyan rabiweste.

Ev heftê sedsal in ku mirovatiyê li hember zagonên çewt serî tewandiye û êdî ji zagonên baştir û abadînî fam nake. Çavên mirov nasî ronahiya qels a mûm û şemalan bûye loma êdî tava rojê nabînin. Nesaxiya giyanî ji nifş û cêlekî ji yê din re dimîne ta ku dibe beşek ji mirov bi xwe û êdî mirov wê ne wek nesaxiya giyanî lê wek xelatek yezdanî, ya ku Yezdan dabûbe Adem, dihesibîne. Eger ew mirov kesek ji tovê vê nesaxiya giyanî azad bibînin, ew ê wê/wî wek bêşerm û bêşeref bihesibînin.

Ew kes, ên ku bi bedgumanî ji Selma Karamy bifikirin çimkî ew ji mala mêrê xwe derdiket daku min di ayîngehê de bibîne, nesax in û ji xwezaya xwe niyazqels in û li dij kameranî û tendurustiyê ne. Ew mîna wan mêş û pêşûyan in ên ku di tarîtiyê de xwe diqilizînin çimkî ditirsin ku bikevin ber dest û piyên meşvanan.

Girtiya/ê zorlêkirî, ya/yê ku dikare xwe ji girtîgehê bifilitîne û xelas bibe lê dîsan jî wisan neke, tirsonek û bizdok e. Selmayê, girtiya bêgune û zorlêkirî, nedikarî xwe ji koletiyê xelas bike. Ma çi guneyên wê hebûn ku wê ji pencereya girtîgeha xwe li mêrgên hêşîn û

esmanê fire dinerî? Ma çima mirovan ew wek bêbawer û tawanbar dihesiband ku ji mala mêrê xwe derdiket daku bê li rex min, di navbera Mesîh û Îştare de rûne? Mirov çî dibêjin bila bibêjin; Selmayê ew avzêl, a ku giyanên kesên din tê re dixeniqin, xelas kiribû û gihabû wê cîhanê ya ku mirov bi zûrîna bi guran an jî bi xişîna bi mar û xwexişokên din re ticaran nikare bigihiyê. Xelk çî dixwaze, bila di barê min de bibêje çimkî giyan, ê ku sawêra mirinê dîtibe, êdî ji rûyê dizan natirse; şervan, a/ê ku dîtibe ku şûr li hindavî serê wî dibiriqin û xwîn li ber piyên wî diherike, ji wan kevirokan, ên ku kurikên biçûk li ser kuçe û kolanan diavêjinê, aciz nabe.

## GORÎ

Rojekê ji rojên dawiya meha pûşperê, dema ku mirov ji bajar derdiketin û ji bo ku ji germiya havînê birevin xwe dispartin çiyayan, min, mîna berê, ji bo dîtina Selmayê berê xwe da ayîngehê û pirtûkek helbestan a endelûsî jî bi xwe re bir. Ku giham ayîngehê, ez rûniştim û li Selmayê pam, carinan min li rûpelên pirtûkê dinerîn, û hin perçe ji wê bi deng dixwendin ku dilê min ji hal dibir û bîranînên padişa, helbestvan û şovalye, yên ku xatirxwestin li Granadayê dikirin û bi çavên hêsirbar û dilên xembar war,

dêr û hêviyên xwe di cî de dihiştin, dianîn bîra min. Piştî bîskekê min dît ku Selma nêzî ayîngehê dibe û ew bi meşa xwe re xwe dida ber sîber û sîtafka xwe mîna ku hemû xemên dinyayê li ser milên wê bin. Dema ku ew ket hundurê ayîngehê û li rex min rûnişt, min nîşana guherekê di rûyê wê de sihirand û ez meraqdar bûm ku bipirsim.

Selmayê di cî de dozand ka dilê min çî dixwest, destê xwe danî ser serê min û got: "Were nêzî min, were, evîndarê min, û bihêle ku ez tîniya xwe bişkînim çimkî bîska jihevveqetîna me hatiye."

Jê pirsîm: "Ma mêrê te pê hesî ku em li vir hevdu dibînin?" Wê bersivand: "Mêrê min ne dizane û ne jî bala wî dikişîne ka ez çawa dema xwe derbas dikim ji ber ku ew bi wan keçên reben, ên ku ji ber belengaziya xwe ketine xaniyên xerab û bêşeref, re dema xwe derbas dike, bi wan keçan re ku ji bo bidestxistina pariyek nanê bi xwîn û ronikan pêtî xwe difiroşin."

Jê pirsîm: "Çî asteng li pêş te hene ku tu nîkarî bê vê ayîngehê û li pêşberî Yezdan bi sernermî li rex min rûnî? Ma giyanê te te mecbûrî veqetîne dike?"

Wê bi çavên ronikbar bersivand: "Na, evîndarê



min, giyanê min naxwaze ji te vebiqete çimkî tu beşek ji jiyana min î. Çavên min ticaran bi lênerîna te nawestî ji ber ku tu ronîya wan î; lê eger felekê wisan li ser eniya min nisîvîbe ku ez ê di jiyana xwe de zincîrkirî bi rêyek bestîn û kevirîn ve bimeşim, ma ez ê bipejirînim ku îradeya te jî bibe mîna ya min?" Paşî wê lê zêde kir: "Ez ne dikarim her tişt bibêjim çimkî ziman ji ber janê lal e û ne jî dikarim ji her tiştî bipeyivim; lêv bi xeman hatine morandin loma nikarin bilivin; tenak tişt, a ku dikarim ji te re bibêjim, ew e ku ditirsim ku tu ê bikevî heman dav û xefikê ya ku ez ketimiyê." Paşî pirsîm: "Tu çi dibêjî, Selma, û ji kê ditirsî?" Wê destên xwe dan ber rûyê xwe û got: "Metran

pê hesiye ku min her mehê carekê ew gor, a ku wî ez tê de binax kirime, bi cî hiştiye."

Pirsîm: "Ma metran ji hevdîtînên me yê li vir haydar e?" Wê bersiv da: "Eger wî bizaniya, te dê ez li vir, li rex xwe nedîtima, lê ew guman dike û wî fermanîye ku hemû xizmetkar û zêrevanên wî bi seqbêrî çavnêriyê li min bikin. Hestek bi min heye ku xanî, yê ku tê ve dijîm, û rê, ya ku pê ve dimeşim, tijî çavên lêner, tiliyên lêger û guhên guhdar in ku ta pistîna ramanên min jî dibihîzin."

Ew bîskekê bêdeng bû, hêsir ji çavên wê di ser

gep û alekên wê re diherikîn, dû re domand: "Ji metran natirsim çimkî şilbûn nikare xeniqbar bitirsîne lê ditirsim ku dibe tu bikevî xefik û davên wî û gorî wî bibî; tu hê mîna ronahiya rojê ciwan û azad î. Ji wê felekê, ya ku hemû tîrên xwe berdane sînga min û tê re çikilandine, natirsim lê ditirsim ku bibe mar bi piyên te vebide, wan bijarîne û bigezîne û nehêle ku tu hilbikevî gupika çiya ku lê pêşerojek dilhebîn û biriqdar bendewarî te ye."

Min got: "Ew kes, ê ku maran pê ve nedabin û gurên tarîtiyê negezandibin, dê hertim ji aliyê roj û şevê ji ser rêya rastîn tê xirandin û berzandin. Lê guhdar be, Selma, bi seqbêrî guh bide min: ma jihevveqetîn tenak rê ye ku em ji bedgumanî û nizmneriya mirovan birevin? Ma rêya meşa evîn û azadiyê girtî ye û ma ti çare ji

bilî sertewandina li ber niyaza koleyên mirinê ti tiştêk din nîn e?"

Wê bersivand: "Ji bilî veqetîn û xatirxwestina ji hevdu ti rêyên din tine ne."

Giyane min li ber wê serî hilda, min destê wê girt û bi tengizarî got: "Ji mêj de ye ku me serî li ber îradeya mirovan tewandiye; ji gava me hevdu dît ta niha, kor rêberên me bûne, û bi wan re me ayindariya pût û senemên wan kiriye. Ji bîska min tu dîtî şûnde, em herdu di destên

metran de mîna du gogan bûne û wî li gor dilê xwe em virde-wirde avêtine û bi me lîstiyê. Ma em ê radestî îradeya wî bibin ta ku mirin me ji vir bifilitîne? Ma Yezdan giyanê jiyânê da me ji bo ku em gorî mirinê bikin? Ma Wî azadî da me daku em ji koletiyê re bikin sîber? Ew kes, ê ku bi destên xwe agirê ruhê bifetisîne, li ber çavên Yezdan kafir e çimkî Yezdan agir vêxist daku di giyanê me de hil bimîne. Ew kes, ê ku li dij çewisandinê li ber xwe nede, xiyametê li nefsa xwe dike. Ez ji te hez dikim, Selma, û tu jî ji min hez dikî; û evîn durr û cewerek bihagiran e, ew xelata Yezdan e ji bo giyanên pêşwazxwaz û bînfirê. Ma em ê vê morîkê biavêjin û bihêlin ku beraz pê lê bikin? Ev cîhan tijî sosretî û bedewiyê ye. Çima em di vê kenda teng de, ya ku metran û hevkarên xwe ji me re kolîne, de dijîn. Jiyan ji bextewarî û azadiyê tijî ye; çima em vî nîrê giran ji ser milên xwe neavêjin û zincîrên piyên me pê girêdayî neşkînin û bi azadî ber bi aştiyê de nemeşin?

Rabe ser xwe û em ji ayîngeha biçûk bikevin nav ayîngeha gewre ya Yezdan. Em vî welatî bi hemû koletî û cahiliya wî re bihêlin û bifilitin. Were, em biçin welatek din ê ku li dûr e û destê dizan nagihiyê. Em biçin ber peravê li bin esmanê şevê û em belemekê bigirin, bila me di

ser oqyanûsan re derbas bike û bibe welatek din  
ku em lê jiyaneke nû, jiyaneke tijî bextewarî û  
hevtêgihî bibîn. Dudil nebe Selma çimkî ev  
bîsk ji tacên zêrîn ên padişayan û textên berz ên  
firîşteyan bihagîrantir in. Em bidin pey ronahiyê  
ya ku dê rêberiya me bike û ji çolistanê welatê  
tavê biraştî me ber bi mêrgên hêşîn, ên ku gul û  
giyayên bînbiheştî lê şên dibin, de bibe.

Wê serê xwe hejand û çavên xwe li tişteke nebîn  
ê li banê ayîngehê gerandin; bişîrek xemgîn ket  
ser lêvên wê, dû re got: "Na, evîndarê, na,  
Yezdan qedehê tijî sêk (sîrke) û zefranê da  
destê min; min xwe mecbûrî vexwarina wê kir  
daku bi hemû tîrşî û nexweşiyê bihesim û bijîm  
ta ku ji bilî çend çîpan tişteke nemîne, û ez ê dû  
re wan çîpan jî bi sebir û aramî vebixwim. Ez  
êdî ne hêjayî jiyaneke evîndarî û aramiyek nû me;  
ez êdî hew dikarim xwe li ber bayê evînê û  
dilşadiyê bigirim çimkî balindeyên baskşkestî  
nikarin li esmanên berfire bifirin. Çav, ên ku  
nasî ronahiya qels a şemalokan bûbin, ne tîr  
bihêz in ku bikarin bi çavên zîq li hetavê  
binerin. Ji min re basa bextewariyê neke;  
bîranîna wê dilê min têşîne. Ji min re qala aşî û  
aramiyê neke; siya wê min ditirsîne; lê li min  
binere û ez ê pêtala pîroz, a ku Yezdan ji

xweliyê di dilê min de şên kiriye, nîşanî te

bidim, tu dizanî ku ez, bi qasî dayik ji kurê xwe yê yekane, ji te hez dikim, û bi tenê evînê ez fêr kirim ku te biparêzim, ji xwe bi xwe jî te biparêzim. Evîn, a ku bi agir hatiye pakkirin, rê nade ku ez ber bi welatek dûr de bidim pey te. Evîna bisînor dixwaze ku berdiliyê xwe radest bike û bixe bin destê xwe lê evîna bêsinor bi risqê xwe razî ye. Evîn, a ku di dema hilketina zaroktî û xortaniyê de diwelide, dixwaze bibe xwedî û bi pelandinê mezin dibe. Lê evîn, a ku li ber bilindiya qeraxa esman bişkivî û bi sirr û nihînên şevê daket erdê, ji bilî abadînê û nemirinê bi tiştêk din qîma xwe naîne; ji bilî yezdaniyê ew bi sernermî li hember tiştêkî ranaweste.

Ku min zanî metran dixwaze rê li ber min bigire daku ji mala birazayê wî dernekevîm û dixwest ku tenak gencîneya min ji min bistîne, ez bîskek gelekî dirêj li ber pencereya xwe sekinîm û min li deryayê nerî, li ser welatên bêyom mezin ên li pişt wê, azadiya rastîn û xweseriya şexsî, ya ku li wan deran dikare bê bidestxistin, ponijîm. Min hest pê kir ku tam li nêzî te dijiyam, sîbera giyanê te dora min pêçandibû, noqîbûm kûratiya pevgirêdana te. Lê van hemû ramanan, ên ku dilê jinê geş dikin û serê wê li hember adet û kevneşopiyên paşdemayî û ji bo jiyanek di bin siya azadî û dadmendiya hildidin, ez

bawerandim ku ez lawaz im û evîna me  
berbendkirî û bêhêz û bêşiyar e ku li hember  
rûyê rojê rabibe ser lingan. Ez mîna padişayekî,

yê ku welat û gencîneyên wî jê hatine rifandin û  
çopandin, girîm lê demek dirêj pê ve derbas  
nebû ku min rûyê te di ronikên xwe re dîtî û hat  
bîra min ku te carekê ji min re çî gotibû. (Were,  
Selma, were em li hember hilbûna bahozê  
asêgehek bihêz bin. Em mîna şervanên biste bin  
li pêşberî dijmin û em dijberî çekên wan bin.  
Eger em bimirin, em ê şehîd bin û eger em bi  
ser bikevin, em ê egîd bin. Ji revîn û bêdengiyê  
cewertir e ku em pêrgî asteng û belayan bên.)  
Ev gotin, evîndarê ber dilê min, dema ku baskên  
mirinê li raserî nivînên bavê min dipirîn, te ji  
min re gotin. Do, dema ku baskên bêhêvîtiyê li  
hindavî serê min seansên firrê dikirin, hatin bîra  
min. Min hinekî xwe bi ser hev de anî û di  
tarîtiya girtîgeha xwe de pê hesîm ku azadiyek  
bihagiran zehmetiyên li ber me nerm dike û  
xemgîniya me vedimirîne. Tê giham ku evîna  
me bi qasî deryayan kûr, hindî stêran berz û  
temetî esman berfire ye. Ez bi hêzek nû di  
giyanê xwe yê lawaz de hatim vir, û ev hêz jî rê  
dide ku ez xwe gorî tiştê gewer bikim daku  
bigihim yek hê gewertir; ew gorî bextewariya  
min e ku tu di nav xelkê de bi şan û şeref bî û ji

êrîş û xiniziya wan azad û starkirî bî...  
Carên berî vê, ku ez dihatim vî cî, min wisan  
hest pê fikir mîna ku bend û zincîrên giran ez di  
erdê de dibirim xwarê lê îro ez bi dilek têrbiryar  
hatim vir, û biryara di dilê min de bi zincîrên  
min dikene û meşa rêya min sivik dike. Her car  
ez mîna sawêrek tirsî diketim nav vê ayîngehê lê  
îro mîna keçek gernas, a ku pêwîstiya gorîbûnê

dizane û nîrxê jankişandina xwe fam dike,  
hatim, mîna keçekê ya ku dixwaze berdiliyê xwe  
ji bedgumaniya xelkê û birça giyanê xwe bi xwe  
biparêze. Her car ez mîna sîtafkek recifok li rex  
te rûdiniştim lê îro ez hatim nik te ji bo ku  
ezîtiya xwe ya rastîn li pêşberî Îştare û Mesîh  
nîşanî te bidim.

Ez darek im ku di bin siyê ve şên û mezin bûye  
lê ez ê bihêlim ku çeqên min bîskekê li ber  
ronahiya rojê bilerizin. Ez hatim xatirê ji te  
bixwazim, evîndarê min, û hêvîdar im ku  
xatirxwestina me jî dê bi qasî evîna me berz û  
bilind be. Bila xatirxwestina me mîna agirekî be  
ku zêr bihelîne û wî ji nû ve hê biriqdartir bike."  
Selmayê nehişt ku biaxivim û ne jî li dij gotinên  
wê derbikevim lê wê bi çavên biriqdar û rûyê  
nirxtijî li min dinerî mîna firîştetekê ya ku  
hêjayî hurmet û guhdarîkirinê ye. Paşî wê xwe  
avêt hemêza min - ticaran berî hingê wisan

nekiribû - û destên xwe yên nerm li dor min  
pêçandin û maçek dirêj, kûr û sojyar danî ser  
lêvên min.

Dema ku roj ava bûbû û tîrêj ji nav bexçe û  
cinînan bi xwe re biribûn, Selma ber bi navenda  
ayîngehê de meşî û demek dirêj li dîwar û  
quncikên wê nerî mîna ku xwestibe ronahiya  
çavên xwe birijîne ser û nav nîgar û sembolên  
wan. Paşî ew ber bi pêş de meşî û li ber Mesîh  
rûnişt ser çokan, piyên Wî maçandin û bi dengê  
nizm pistî: "Ax, Mesîh, min xaça Te bijartîye û

dev ji cîhana bextewarî û zewqê ya Îştare  
berdaye; li şûna kulîlkan, min serê xwe bi  
striyan xemilandiye û li şûna dermanên gulavî,  
min bedena xwe bi xwîn û hêsiran şûştiye, min  
sêk û tirşî ji qedeha mey û nektarê vexwariye;  
min bipejirîne, Birêz, bila ez jî bibim yek ji  
hevrêyên Te û bi yên Tu bijartî re, bi yên bi êş  
azarên xwe razî û di bextreşî de jî dilşa re,  
rêberiya min bike."

Dû re ew rabû ser xwe û got: "Niha ez ê bi  
dilxweşî vebigerim şkefta xwe ya tarî, jîngeha  
sawêrên tirsîner. Di ber min de nekeve, delalê  
min, û ji ber min xemgîn jî nebe çimkî ew giyan,  
ê ku carekê geşiya Yezdan bibîne, êdî ji sawêrên  
ehrîmenan natirse. Û çav, ê ku carekê li Esman  
binere, êdî nikare ji aliyê êş û azarên dinyayê de



bê miçandin."

Piştî bilêvkirina van gotinan, Selma ji ayîngehê derket; û ez li wir ketim nav deryaya kûr a ramanan ku bi axretê re helî nav hev û bû cîhanek ku Yezdan lê li ser textê xwe rûniştî ye û firîşte jî xêr û guneyên mirovan dinivîsin û giyan trajediya jiyane pêşkêş dikin û horiyên Esmen sirodên evîn, xemgînê û nemirinê distrin. Bûbû şev dema ku ji gêjbûna xwe şiyar bûm û pê hesîm ku li nav baxçe me û min her gotina Selmayê gotî dubare û sedbare dikir û herwiha bîskên wê yên bêdengiyê, destdan, mîmîk û rûgerandina wê li bîra min bû ta mebesta xatirxwestin û tenêmanê ji min re zelal û averû

bû. Ez bînteng bûbûm û xemgîniyê piştî min şandibû. Hingê yekem car tê giham ku, tevî ku mirov azad diwêlîde jî, dîsan dibe koleyê zagonên tund ên bavkalên danî û her wisan dimîne; û qeraxa esman, a ku li gor me qaşo bêguher û bêtevger e, ev roj wê diçemîne jêr îradeya sibeyê, û roja do dixê jêr îradeya vê rojê.

- Gelek caran piştî wê şevê ez li ser wê zagona pîroz, a ku wisan kir ku Selma mirinê ji jiyane birûmettir bibîne, fikirîme û gelek caran min geweriya gorîbûnê û berxwedana bextewariyê dane ber hev ji bo ku zelal bikim ka kîjan jê zelaltir û bedewtir e; lê ta niha min ji wê tiştê bi

tenê rastiye derxistiye, û ew rastî jî dilpakî yeku hemû kirinên me kirin bedew û rêzdar. Û ev dilpakî li nik Selma Karamy hebû.

## FELATKAR

Pênc sal ji zewaca Selmayê derbas bûn lê hê jî zarokek jê re newelidîbû ku bikare pêwendî û pevgirêdanên Selmayê û mêrê wê yên giyanî bizeximîne û xurt bike û giyanên wan ên nakok bigihîne hev.

Jinên stewr ti qîmetek xwe nîn e çimkî pirraniya mêran dixwazin xwe bi zarrên xwe nemir bikin. Li ber çavên mêrê dewlemend jina bêzarok dijmina wî ye; ew mêr nefretê li jina xwe dibarîne, wê bi tena serê xwe dihêle û hêvî dike ku ew zû bimire. Mensor Bey Galib jî mêrek wisan bû; ji aliyê maddî de ew mîna erdê bû û mîna polat req û mîna gorrê hesûd bû. Tevî hemû bedewî û şîrîniya Selmayê jî, hêviya wî, ku wî zarokek hebe ku nav û şerefa wî hilbîne, wisan kir ku ew kînê li Selmayê bike.

Dar, a ku di şkeftê ve şên bûbe, fêkî nade.

Selmayê, ya ku li ber siya jiyane dijiya, zarokek nedidayê...

Bilbil hêlîna xwe di rekeyê de çênake daku koletî nebe feleka jiyana têtjikên wê... Selma girtiya barên xeman bû, û îradeya yezdanî bû ku ew zindana xwe bi girtiyek din re beş neke.

Gulên mêrgan zarokên dilnermiya rojê û

hezkirina xwezayê ne, û zarokên mirovan jî

gulên evîn û berketinê ne...

Giyanê evîn û berketinê li mala Selmayê a

bedew li Ras Beyrouthê tine bûn tevî ku Selma

her êvar xwe dida ser çokan û ji Yezdan

daxwaza zarokekê/î dikir ku jê re bibûya

ewletîdar û xemrevîn... Wê bênavbirr lava û dua,

tika û rica dikirin ta ku Yezdan bersiva wê da...

Dara şkeftê bişkivîbû û kulîlka wê peqîbû daku

dawiya dawîn fêkî bide. Bilbil di rekeya xwe de

dest pê kiribû ku hêlînê ji perrên xwe çêbike.

Selmayê destên xwe yê zincîrkirî raberî Esman

kirin daku pêşwaziyê li xelata bihagiran a

Yezdan bike, û ti tiştê di dinyayê de tine bû ku

ew bi qasî dayikbûnê bextewar bikira.

Ew bi nearamî dipa, roj dijimartin û bi pêşînî

dilxweş bû ka kengî bedewtirîn awaza Esman

ango dengê zarok(ê) bê guhên wê...

Wê êdî didît ku berbanga pêşerojek rontir di nav

hêsir û ronikên wê de xwiya dibe.

Li meha nîsanê Selma ket nav nivînên êş û janên

welidandinê, ciyê berxwedana jiyan û mirinê.

Doktor û pîrik amade bûn ku nûhatî berbidin

dinyayê. Li derengiya şevê Selmayê dest bi

giriya xwe yê berdewam kir... girî ji bo jiyanê ya

ku jiyanê dihêle... girî ji bo berdewamiyê li

qeraxa esmanê valatîyê... girî ji bo bêtaqetiyê di

nav bêdengiya hêzên gewre de... girî ji bo Selmaya reben a ku di bêhêvîtiyê de di nav hevşidandina jiyana û mirinê de paldayî bû. Spêdeyê Selmayê kurikek welidand. Dema ku wê çavên xwe vekirin, wê rûyên bibişir li her aliyên xwe dîtin, û paşî, ku wê dîsan lê nerî, wê dît ku jiyana û mirin li ber nivînên wê li hember hev tê dikoşin. Wê çavên xwe danîn ser hev û yekem car got: "Ax kurê mino." Pîrikê zarokê sava di nav dergûşa armûşî de pêçand û ew danî rex dayika wî lê doktor çavnerî li Selmayê dikir û serê xwe dihejand.

Dengên dilxweş cîran şiyar kirin û wan cîranan xwe lezandin û gihan bavê kurik pîroz kirin lê doktor dîsan jî her çavên xwe li Selmayê digerandin û serê xwe dihejand...

Xizmetkaran xwe lezandin daku mizgîniya xêrê bigihînin Mensor Bey lê doktor her fedikir Selmayê û zarokê wê û nîşana dilsariyê li ser rûyê wî bû.

Bi rojhilatinê re Selmayê kurê xwe rakir ber sînga xwe. Zarok cara yekem çavên xwe vekirin; dû re ew hilceniqî û dawîn car çavên xwe neqandin. Doktor zarok ji ser destên Selmayê girt, û ronik diketin ser gep û alekên wî; paşî got: "Ew mêvanê mirinê ye."

Di dema cejna cîranan bi bavê re bi munasebeta  
bextewariya welidîna zurriyetê de, kurik ji vê

dinyayê koç kir; û Selma li doktor nerî û tika jê  
kir: "Zarokê min bidin min, bihêlin ez wî  
bihemêzînim."

Tevî ku zarok mir jî, şingîna glas û qedehan li  
salonê her ber bi bihêzbûnê de bû...

Ew li berbanga spêdeyê welidî û bi rojhilatinê re  
mir...

Ew mîna ramanekê welidî û wek oxînekê mir û  
şibî siyekê wenda bû.

Ew nejiya ji bo ku xema diya xwe birevîne û  
bisteyiyê bidiyê.

Jiyana wî li dawîya şevê dest pê kir û li zelalbûn  
rojê bi dawî hat mîna çipek avê ya ku çavên  
tarîtiyê rêt û pêghana ronahiyê ziwa kir.

Ew durrek bû ku hilketina avê ew anî qeraxê û  
daketina wê vegerand kûratiyên deryayê.

Sosinek bû ku hê nû kulîlka wê ya jiyane  
bişkivîbû lê piyên mirinê ew di bin xwe ve  
merçiqand.

Mêvanek xweşviyayî bû ku hatina wî dilê  
Selmayê şa kir lê çûna wî giyanê wê kuşt.

Wiha ye jiyana mirovan, jiyana gelan, jiyana roj,  
heyv û stêran.

Û Selmayê berê xwe da doktor û qîrî: "Zarokê  
min bidin min û bihêlin ez wî hemêz bikim.

Kurê min bidin min û bihêlin ez wî bimêjînim."  
Paşî doktor serê xwe çemand. Dengê wî fetisî û  
wî got: "Zarokê we miriye, xanim, baldirêj û  
aram bin. Serê we sax be."

Piştî bihîstina daxwiyaniya doktor Selmayê dest  
bi girîn û qorînek bêpayan kir. Paşî ew bîskêkê  
aş bû û bi dilşadî bişirî. Rûyê wê geş bû mîna ku  
haya wê ji tiştêkî bûbe, û wê bi dengnizmî got:  
"Zarokê min bidin destên min; wî bînin nêzî  
min, û bihêlin ku wî mirî bibînim."

Doktor zarokê mirî anî nik Selmayê û ew danî  
ber hemêza wê. Selmayê ew hemêzand, paşî wê  
berê xwe da dîwar, û ji kurê xwe yên mirî re  
axivî: "Kurê min, tu hatî ku min bi xwe re bibî;  
tu hatî rêya ber bi qeraxê de nîşanî bidî. Va ye,  
ez li vir im, kurê min; bide pêşiya min û em ji vê  
şkefta tarî bifinin û biçin."

Û di heman bîskê de tîrêja tavê di nav perdeyên  
pencereyê re xwe avêt hundur û xwe gihand du  
bedenên mirî li nav nivînan ên ku bédengî  
zêrevana wan û baskên mirinê jî siya wan bûn.  
Doktor bi çavên hêsirbar ji odayê derket û dema  
ku ew giha salona mezin, şahî bû şînî lê peyvek  
jî ji devê Mentor Bey Galib derneket û wî  
ronikek jî nebarand. Ew, meyqedeh di destê  
rastê de, mîna peykelekî bêliv li ciyê xwe ma.

Roja din kincên spî yên bûkaniyê li Selmayê

hatin kirin û ew kir di tabûtê de; kifinê zarok dergûşa wî, tabûta wî hemêza diya wî, gora wî jî bersînga sar a dayika wî bû. Du cendek di yek tabûtê de dihatin hilgirtin, û ez bi hurmetek kûr bi girseya gel re bûm û me Selma û zarokê wê birin arimgeha wan.

Ku em gihan nav goristanê, qeşeyan bi rêberiya metran Galib dest bi nivêj û duayan kirin, û li ser rûyên wan ên tarî perdeya cahilî û bêwatetiyê hebû.

Dema ku tabût hat definandin, yekî ji tehiçinan got: "Ev yekem car e ku ez du cendekan di tabûtekê de dibînim." Yek din got: "Wer dixwiye ku zarok hat daku dayika xwe ji nav pencên mêrê bédil xelas û felat bike."

Yek din: "Li Mensor Bey binerin: ew çavên xwe li esmanan digerîne mîna ku çavên wî şûşe bin. Qet ji wî naxwiye ku wî kur û jina xwe di heman rojê de ji dest dane." Yek din lê zêde kir: "Sibê mamê wî, metran, dê wî bi jinek hê dewlemendtir û bihêztir re bizewicîne."

Metran û qeşeyan fuar û şîrên xwe domandin ta ku gorkol gor dagirt. Paşî girse, yek bi yek, nêzî metran û birazayê wî bû û bi her celeb gotinên şîrîn û dilhebîn serxweşî li wan kir lê ez, bê ti xemrevîniyek giyanî, ji wan varê bi tena serê xwe radiwestîm.

Dû re tazîvan ji goristanê verevîn lê mera gorkol di destî de bû û ew li hindavî gora nû rawestîbû.

Ez nêzî wî bûm û jê pirsîm: "Gelo tê bîra te ka Faris Efendî li kû hatiye binaxkirin?"

Wî bîskeke li min nerî, tiliya xwe ber bi gora Selmayê ve kir û got: "A li vir; min keça wî li hindavî wî defin kir û kurê wê jî di hemêza wê de, û bi vê merikê min dîsan ax avêt ser hemûyan."

Paşî min got: "Te dilê min jî di vê kendê de defin kiriye."

Ku gorkol li pişt darên spîndaran wenda bû, min êdî hew karî li ber xwe bidim; ez şewişîm ser gora Selmayê û girîm.

---

Wergerandin ji çapa îngilîzî "Broken Wings":

Husein Muhammed

Şivan Kavê

140

\*\*

**BILÎCAN**

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

NEFEL

Bilîcan

1

**BILÎCAN**



## 2 BILÎCAN

Bilîcan

PERWÎZ CIHANÎ

NEFEL

Stockholm

2002

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

3

BILÎCAN

Perwîz Cihanî: Bilîcan

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

© Perwîz Cihanî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-89687-12-4

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike

û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4 BILÎCAN

Pêşkêş e bo gîyanê pîrozê  
hemû dengbêjên kurd,  
ko li gumnavî û  
bêdengîyê da  
mirin.

Evdilê Begzade ko rehmet lê be  
Nûra Xwedê tijî li nav gorê be  
Strana Ker û Kulik wî digot  
Dilorand û dilê xwe pê ra disot  
Dema ko Werdê porên xwe vedirot  
Dengbêjê me gel wan kulan dibû cot  
Rûyê kever bi hêsiran wî dişot  
Ax Şilêrok

5

BILÎCAN

6 BILÎCAN

1

Givegiva bayê derbuharê ye. Taze xal ketine pêsîra çiyayên bilind û  
ser-  
ferazên Kurdistanê û damênên wan diqdiqî reş û belek bûne. Avên  
belekiyan her wekî mar û ziyan li pêsîr û berpalên çiyân, li kaş û dol  
û  
geliyan, ber bi nişîv, ber bi kêş û rastiyan dişûlikin. Eger Mirovî li  
serê

girekî, li qûça bilindeçiyayekî, yan li binê besteke dûr û deşteke vekirî,  
yan geliyekî kûr û ji dûr va raweste û hûr û kûr dîna xwe bide wan avên  
keviyan û wan çiyayên serkever û bêhinveker, her yek ji wan çiyayên  
bilind, dê wekî bûkeke şariye taze xemilandî bêne ber çavên mirovî,  
ko  
her yekê kirasekî sipî çîle bûkinyê li xwe kirine û xwe li ber çavên zavayi  
ra dinazînin. Ew avên belekiyan jî bînanî rişî û qeytanên zîvîn û xişî  
û ri-  
helan li ser bejin û balên wan yên bilind da şor bûne û li pêşîra wan da  
birbirî xwe jor da berdane û li ber piyên wan da xwe têkelî çem û rûbaran  
dikin. Çem jî ser hev û ber hev ra pêlan li ser pêlan vedidin û dihurmicin  
û kef li ser ketî pêş da dixişikin. Her yek ji wan çemana wekî kobeyên mezinên zîvînin,  
ko dorandorî kirasê çiftexasê bûkinyê ra hatine dirûnê.  
Ew teqalên ko taze reş bûne jî, bînanî çepikên gulan li ser dava wan ki-  
rasana da bera mirovî li ser xwe da radikêşin.  
Çavkaniyên li pêşîra çiyayên jî bînanî (wekî) qaşên almastê li ser sîngê çiyayên,  
li ber tavê diçilvilin.  
Ew avên belekiyan, dema ko tav lê dide, dûr va bînanî xodîkan rewneq

dikevinê û difirin nav çavên mirovan. Îca ew mirovên ko dûr va li serê

çiyayekî, yan li binê bestekê çav li wan avana dikevin, hema bixwe xwe se-

ha tîhnîtiyê dikin û dilên wan dibijn wê ava ron û çilvilok. Ê li dilên xwe

da dibêjin:

»Xwezî qurtek ji wê avê li ser dev û lêvên me ketiba.«

Lê dema tu nêzîkiyê bi wan avan dikî, dilê te tevî hev dibe û bîzê te naçê

tu lê mêze bikî. Ew avên tevda qur û lîl, avên şêlo, ko kirs û kewal, qirş û

qal, pûş û pelaş, qurm û kot li ser ketine. Avên ko rûyê bedew û cindiyan

li xodîka pêlaviye wan da qîloqaco têne xûyanê.

Axa zivistanê li ber sir û sermayê sistopisto bûye. Sirê li xakê daye û ew

bêgiyan kiriye.

7

BILÎCAN

Bayê derbuharê tevî tava şîrogerm, keviyên berfa kuşregirtî û qeşayê di-

avînin. Îca avên belekiyan bînanî xûna birîndarên ko leşê wan bi reşêşkên

gulle û bi derbên tîr û şûran kunkunî bûbin, li rehên erdê ra dikişin û li

ser leşê wê ra dişûlikin. Îca li gelek ciyan da ew avan tevlihev dibin  
û xwe  
jor da berjêr, ber bi newal û geliyan, ber bi nişîv berdidin û xweliya  
nerm  
û sirêbirî li pêşîra erdê diqoqilînin û dikin herî û di gel xwe ber bi jêr  
dix-  
işikînin. Rûyê erdê, ew teqalên reşbûyî wisan celxcelxî, tîştîştî û  
şivîşivî  
dibe, ko tu dibêjî qey pişîkan daye ber pencerûskan.  
Li vî danê salê û li demeke weha da, eger mirovîekî tîhnî rastî wan  
avan  
bê, eger li ber tîhnîtiyê kezeba wî bişewite jî, eger agir li dilê wî  
bikeve jî,  
eger dîzka hûrê wî bikuzure jî, eger cîhan lê bibe germiyana Enfalê  
û ço-  
la Kerbelayê jî, li ber şêlûtî û gild û gemarê bîzê wî naçe wê avê, ta  
ko  
qurtekê, heylo dilopekê, heylo çiravekê ji wê avê li ser can û cîger û  
hi-  
navên xwe da bike û kezeba xwe ji şewatê û dîzka hûrê xwe ji sotinê  
riz-  
gar bike. Hema rastî jî ew avan »dûrkujên nêzîk xisar in.«  
Ca li destpêka Adarê da, bayê buharê, ko li her navçeyekê da navek  
lê  
kirine, dest pê dibe.  
Bayê derbuharê bayekî demdemkî ye. Hindek caran wisan nerm û  
germ û êm û dilhebîn e, ko dilê mirovî dixwaze, mirov gepkên  
rûmetê

xwe bispêre ber destên wî, da ko bînanî giraviyeke dilovan û yareke  
dil-  
hebîn gepkên rûmetê mirovî bi evîn û hijmekarî mist bide û  
biperixîne û  
bi destên xwe yên dilovane nerme nol, rûmetê serma û  
zemherîrdîtî û li  
ber sir û seqemê tevizî, bi dil û can tevvide. Dilê mirovî dixwaze, ko  
ewî  
bayî bi giştî hêza leş û giyan, bi dev û difinan hilmije şah xwe û  
bikişîne  
sebeta sîngê xwe û sîngê xwe pê paqij bike. Bêhna wî bayî tijî ye li  
bêhna  
gulavîn e, xaka paka taze ji bin berfê derketî. Bêhneke hind xweş û  
dil-  
veker ji wî bayî tê, tu dibêjî hema bêhna gulan bixwe ye. Rastî jî  
hema  
gereke, ko ev bêhna, bêhna gul û kulîkan be. Gul û kulîlkên ko hê ji  
cîhana jêr axê rizgar nebûne û hê serê xwe li jêr xaka giran  
dernexistine.  
Lê hêdî hêdî pinc û reh dajon û dixwazin erdê biqelêşin û şax bavêjin  
û  
xwe ji cîhana teng û tariya binerdî rizgar bikin. Yan jî hema bêhna  
leşên  
wan gul û kulîlk û gîha û pincarana ye, ko sala çûyî li ber bayê tunde  
payîzê qîşirîn e û pelgên wan yên nazik û xweşik li ber bayê weşiyar  
e û li  
jêr pê û siman hatine pişirandin û pişaftinê û bûne xwelî û têkelî axê

bûne. Bi her cureyî bêhn bêhneke gulavîn û nasiyar e. Bêhna gul û sosin

û beybûnan e. Bêhna catirî, pûng, sîrmo, kurad, hindiş, siyabo, hewşan,

pojan, rihan û piltanên beyanîn e. Bêhna şembele û sêpelge û once û ko-

## 8 BILÎCAN

rînganên beyaran û sorgul û sosin û sumbul û benefşe û şevbo û nêrgizên

xuristen e. Mirovî li ber vê bêhnê mest û gêj dibe û di gavekê da giştî derd

û kulên vê cîhana xortxapîn ji bîra mirovî diçe. Lê ev sermestî û serxweşiya hind dom nake. Lewra ko ew bayê wisan bêhinveker û can-

bexş û dilhebîn ne ji gav da, hema li çavqirpandinekê da, hema li bêh-

nvedanekê da tê guher rînê. Wisan ne ji gav da tê guherînê, ko mirov

vediciniqe. Dewsa bêhna gul û benefşeyan, bêhna sir û seqem û zuqum

û zemherîrê jê difûre. Ne ji gav da, we lê tê, ko ew bayê wisan bêhnvek-

er, bêhna merg û mirinê jê tê. Ew nermebayê aram, ne ji gav da wisan

dirinde dibe, ko kumê mirovî ji seri direvîne. Wisan tund û guj dibe, ko

çi giyanliberek nikare xwe li ber bigire û destekî li seri, yekî li piştê,  
li dû  
durbe û pesêvekê digere. Eger ew giyanlibere mirov be, xwe davêje  
ber  
pesêva kevir yan dîwarekî. Yan jî çavên xwe li kor, kendal, zang,  
zinar, û  
kûleyekî digerîne, ta ko penahê bibe ber û ji destê wê seqema  
giyanveroj  
rizgar bibe. Eger ew giyanlibere ajeleke dirinde be, xwe davêje  
landa xwe  
ya zivistanî û ji derketina xwe ya derva poşman dibe. Eger kêz û  
kurm û  
cir û canewer be, xwe li celx û qelîşteken erdê da, li bin kevir û lîpan  
da,  
li hêlûn û kun û kunlîs û kûlikên xwe da, xwe dilemisîne û vedişêre.  
Lê  
ev bayê demdemkiyê derbuharê hindêk caran lap tûre dibe. Wisan  
tûre û  
şet û har û dîn û tepoyî dibe, ko çi giyanliber neşên li ber rawestin  
û hey-  
lo li kûlik, celx, durbe, pesêv, land, kûle û hêlûnan da jî xwe  
naêşirînin.  
Ew baya wisan gur û guj dibe, ko berfa kuşregirtî ji erdê radike û li  
nav  
çavên giyanliberan da lê dide. Ewir û esman berev dibin. Rûçikê şîne  
es-  
mani berebere gewir dibe û dibe rûçkê sîrfiroşan. Esman dibe  
pîrejineke



li nav salan da çûyî, porgewir û pirçaloz. Pîreke lorik lê xerabûyî, bi  
bole-  
bol û bilmebilm. Wisan tund û tirş û navçavan bi girê dibe, ko mirov  
sawa kulê jê digre. Mirov nawêre lê mêze bike. Durust hîngaye, ko  
berfa  
çîl û kever li nav çavên giyanliberan direşîne û wan li ber sir û  
seqemê di-  
lerizîne.  
Lê hê demeke xurt nebihoriye, hê te dewsa xwe germ nekiriye, ko  
dîsan  
ser ji nû ewir û esman jev berdidin û hewa vedibe. Sîngê esmani  
qulqulkî  
dibe û berebere esmanê sayî dilê mirovî vedike. Gultên hevgirtiyên  
ewiran wekî komikên ramiyariyên bêtiyaq û hevduxor, birbirî dibin  
û li  
hevdu têne bi paşpaînan û dibijiqin û tekoteko li gultên biçûk û  
bêreng  
da, xwe bi perê asimani va dizeliqînin. Li gavekê da ew esmanê  
ewirayî,  
sayî dibe. Sayiyeke şîn û pîrozeyî. Weke armûşê peng. Wisan saf û  
hulo  
dibe, ko rewneq dikevê. Tava canbexş û cîhanronîker dizeliqîne  
pêşîra

9

BILÎCAN

erdê sikî sar û di gavekê da sîngê erdê disincirîne. Tu dibêjî qey her  
tişt

derew bû. Ne berfê karê barînê fikir û ne ewiran karê girînê, ne jî  
pîra es-  
mani karê por û pirçwerînê. Her tişt ne ji gav da reng û rûyê xwe  
diguherin. Givegiva bayê dir, dibe nermebayekî canhebîn û  
dilveker.  
Bager û bakirêve û tîpî cîhên xwe didin hulmebayekî nerm û sivik û  
bêh-  
nvekerê buharî. Tava germ dîsan piştta mirovî, û dîtir giyanliberan  
ya sar  
û tevizî germ dike. Lê hê jî teltên ewirên gewir û gerok li rex û kujên  
es-  
manê şîn û bêbinî da lev digerin. Tu dibêjî qey hevdu wenda kirine.  
Gultên çiremiyê xwe bi cengelên bilindciyan û bi serê qûçên birekan  
va,  
bi sereyal û yalçînan va dadiliqînin. Tav diqijilîne. Lê hê te çêja  
germayê  
di leşê xwe da baş seh nekiriye, ko dîsan teltên ewirên jevberdayî û  
bijiqî  
destên yêkatiyê didin hev û berevî ser hev dibin. Sireke sar divizînê  
û  
teltên ewran dîsan berevî ser hevdu dibin. Dîsan cîhana ronahî, reş  
û tarî  
dibe. Tav xwe vedişêre. Piştî sireke sar, ko li mejiyê hestikên  
giyanliberan  
da kar dike, pirûskpirûsk berf jor da tê. Bi barîna berfê ra berebere  
sira sar  
veditexire û ba dadinê. Li dû ra pirûskên berfê pil bi pil mezin û  
mezin-

tir dibin û berebere dibin kuliye gir û kever. Hêdî hêdî ew kuliye berfê  
berfê  
dibin şilope. Îca her kuliyeke berfê wekî kotireke çîle kever nermik  
ner-  
mik jor da xwe berdidin ser sîngê erdê. Lê ev kotirên kever hê piyên  
wan  
negiheştine erdê, diavin û ji nav diçin. Temenê van kuliya wisan  
kurt  
e, ko mirov nikare cudatiya nîveka hebûn û nebûna wan û naweya  
bûyîn  
û nebûyîna wan bihejmêre.  
Temenê hindik tiştan li cîhanê da wekî temenê van kuliya kurt û  
hindik e. Wisan kurt û hindik e, ko mirov nizane kînga çavên xwe li  
cîhana ronahî vekirin û kengê ji cîhanê koç kirin. Hê çavên xwe li  
cîhana  
ron venekirine, hê piyên xwe nedanîne ser topa axê, temenê wan  
kuta  
dibe û ji nav diçin. Lê berewajî wan, hindik tişt jî temenê wan dûr  
û dirêj  
e. Bînanî wan kuliye berfê, ewanê ko ev e çendik û çend hezar salin  
li  
serê çiyayên bilinde cîhanê ketine û ta roja îro jî qet hê navê aviyan  
û bi-  
hojtinê nebihîstine. Meriv dikare ji temenekî wisan ra temenekî  
here-  
hereyî bêje. Herçend ko çî tişt li vê keyhanê da herehereyî nîne û  
nikare

hetahetanî wekî xwe bimîne. Lê kê m hêz hene ko bikaribin tiştên  
wiha bi  
sanahî ji holê rakin û bikin mêvanê nemanê. Ne germaya havînê li  
wan  
kar dike, ne jî sermaye zivistanê. Ne tavî û teyrok û reşêşkên tunde  
baranê  
bi wan dikarin û ne jî hêza bahoz û bakurofê dikare wana ji cî  
bileqîne.  
Her tenê tişteke heye. Ew jî tişteke gelekî pêş û pintî û kotî ye. Erê  
ew jî;  
kurmê darê ne ji darê be, riziyanê darê tune. Ew berfa xudanê  
temenê  
10 BILÎCAN

herehere yî jî hindêk caran tûşî kurmên xwe bi xwetiye dibe. Ew jî  
hin-  
dek caran kurmî dibe. Kurmên sipî çîl, durust li ser rengê berfê da,  
ji  
berfê bixwe, ji dawa berfê ketî dikevîne canê berfê û berfê li nav da  
di-  
avînin. Ew kurm bînanî kurmên kotîbûnê dikevîne hinavê berfê û  
ewê  
ber bi nemanê dişînin. Ew kurm li bin va berfê dixon û sîngê wê li  
bin da  
diqoqilînin. Hinavê wê kunkunî dikin û li ser piştê wê ra davêjin. Ca  
hîn-  
gaye, ko hulma erdê li sîngê berfa tîştîşî bûyî ra davêje derva û ew  
berfa

herehereyî ne ji gav da bînanî birîndarekî birînkûr, kûr dinale û  
qîrçîn jê  
tê û li nav xwe da dişkê û ava zipe zelal ji hinavê wê dikişe. Durust  
hîn-  
gaye, ko kezkên kiça erdê, kezkên alekokê, li ber wê ava hinavan  
şax  
davêjin û berebere pirçin dibin. Îca ew li ber neynûka ava hinavan  
kezî û  
biskan badide û xwe ji bo kurê berfê dixemilîne. Lê bi dax û keserên  
gi-  
ran va ta porê alekokê şax davêje û penc vedide, kurê berfê nexweş  
dikeve  
û navçoyî dibe û nava wî xûn dikişe. Êdî kutaya temenê wî pêra  
digîje û  
sal dikeve ser rojrokan. Êdî kurê berfê nikare wê salê zemawendê  
bike.  
Lê ew bêhîvî nîne. Dîsan weke caran dîlan û zemawendê salekê paş  
da  
davêje û dispêre dayîka alekokê, ko dê sala bê bişîne xwazginiyê  
kiça wê  
û evê peyamê jî, ji alekokê ra, ji berdilka dilê xwe yê birîn û  
xoşewîsta xwe  
ya xemrevîn ra dişîne:  
Alekokê pirçinê!  
Berdilka dilê minê!  
Min şureşur ketiye binê.  
Hatime halê mirinê.  
Zemawenda me bila bimîne saleke dinê.

Lê hindî cîhan ava bûye, dema van herdu evîndaran wehaye. Hindî  
ko  
kurê berfê fîkefîka wî ye û amade ye, ko kiça erdê bixwaze, erd  
berhaneyan dîne û dibêje ko hê kezîkên kiça min dirêj nebûne û  
zulfên  
wê nehatine ber badanê. Bihêle bila porên kiça min kûşkê dirêj  
bibin,  
zulfê wê bêne ber badanê û keziyên wê bêne ber hûnanê û çavên  
wê bêne  
ber kildanê paşê. Lê derdê li ser derdan ra, dema ko kez kên kiça  
erdê dirêj  
dibin. Biskên wê têne ber badanê û keziyên wê têne ber hûnanê.  
Çavên  
wê li ber hewiretirîşqeyan têne kildanê û dibe bengebenga wê û ji  
ze-  
mawendê ra amade dibe, mîxabin ko kurê berfê nexoş dikeve.  
Navçoyî  
dibe. Av ji hinavan dikişe. Bi neçarî zemawendê salekê wekî hezaran  
salên  
çûyî paş da davêjin. Lê bi dax û derdên giran va, hindî cîhan cîhan e,  
de-

11

BILÎCAN

ma van herdu evîndarên bêmiraz weha ye û hê jî ta roja îro destên  
wan  
negiheştine hevdu.

Gelo rojekê bê, ko ev herdu evîndarên bêmiraz bi evîna xwe şa bibin?

## 12 BILÎCAN

2

Taze bayê tunde derbuharê danîbû. Taze berfê û şilopê vekiribû.

Erd hê

jî herî bû. Lîlavên şilopê ji erdê dikişyan. Ew li ser kevirê bêriyê

rûniştibû. Destê xwe yê çepê dabû bin jêrçena xwe û kûr diponijî.

Serçokên wî xuriyabûn. Dermilên wî rişî girtibûn. Çarixên wî devê xwe

lê xwar dikirin.

Gencekî bi pîl û şan, bilindbala û tevkuta yî, bi zend û bend, navmilpan û gerdenkela bû. Taze berê simbêlê wî xwidan dabû.

Lê ew gencê han wisan kûr diponijî, ko agah ji deng û sedayên li çar ki-

narên xwe nebû. Dihate bîrê, dema ko taze fam dikir. Taze têdigehîşt.

Taze destê xwe yê çepê ji yê rastê nas dikir, ko li mala wan da şîn bû. A,

hema li vê hewşê da, hema ha li kujê han da, termê xûnaviyê bavê wî

danîbûn ser teneşoyê. Mirîşoyan bi lûfikên sipîçîl xûna wî ya sore gevez

tevî avê dikirin û dişoştin. Leşê wî yê kever li jêr xûnê da derdiket.

Lê xûn

li birînan da ranediwesta. Ta şoştina wî kuta kirin jî, hema wisan xûn ji

birînên wî diza. Durust bînanî kaniyeke avzêm xûn jê vediza. Melayî  
bi  
lez kefen lê wer kir. Lê xûnê da kefeni û ji kefeni ra derbas bû û li  
ser ke-  
feni telte girt. Te digot qey çepikek sorgul avîtine ser kefenê wî û pê  
wê  
çepika sorgulan rêz li gorîbûna wî li rêka av û axê da girtine.  
Hemanê tê bîra wî, şerê wan û bîhaniyan bû. Bîhaniyan avîtibûn ser  
ta-  
lanên wan. Ew bîhaniyên ko carê bi berhaneyekê hêriş dihanîn ser  
cî û  
warên wan. Dixwestin wan ji gundê wan, ji bajarê wan, ji bajarokê  
wan,  
ji warê wan, ji welatê wan, ji av û axa wan derêxin. Dixwestin welatê  
wan  
zorpes bikin û wana têxin bin destên xwe da. Şer, şerê av û axê bû.  
Dujminan rojê berhaneyek ji wan digirtin. Rojê newalek ji kewşenê  
wan,  
geliyek ji warê kal û bavên wan, berxêrek ji zeviyên wan, çiyayek ji  
zozanên wan zorpes dikirin û davîtin ser kewşenê welatê xwe. Rojê  
hin-  
dek ji kewşenê welatê wan bi fend û fêlên dîwanî û ramiyarî, bi qeyd  
û  
qoçan li ser xwe didane nivîsandinê û li ser xwe tapî dikirin. Yan jî  
davîtin  
ser keriyên wan û terş û talanên wan dikişandin. Dîsan weke çendik  
û  
13



## BILÎCAN

çendîn caran dujmini avîtibû ser keriyên wan. Bavê Silêmanî, Eliyê Mîrî  
peyî talanan ketibû. Mêrmêranî şer kiribû. Çend kes ji dujminan kuştibû  
û termên wan dagîrkerane li ser xaka pak velezandibû. Lê hejmara du-  
jmini gelek bû. Eliyê Mîrî tenê bû. Li ber xwe dabû. Çend kesên dî jî pê  
sûngiya xwe ya jehrdadayî birîndar kiribû. Lê derbên sûngiyên dujmini  
li ser sîng û navmilên wî, kelên jê birîbûn. Ta hawarî pê ra gihîştibû,  
ew  
li hespê da jor da ketibû. Li ser axa bav û kalan can dabû. Dujminan ga-  
va ko dîtibûn, hawarî waye bi wane ra digihîje, talan cî da hêlabûn  
û  
revîbûn. Seriyê tu ji pêyan ra gorî bî. Her kesî bi zorê giyanê xwe kiribû  
devê xwe û panî li pê dabûn, herin, ko hûn naçin! Gava ko hawarî gi-  
hîştibû ser termê Eliyê Mîrî, term hê jî germ bû. Lê êdî ji tik û pik ketibû.  
Siwarên hawariyê bêy girîn û şîn, talan li ser zomê da zivirandibûn  
û pê  
sûngî û nêzeyên xwe darbestek girêdabûn. Termê Eliyê Mîrî danîbûn ser

wê darbestê û ji wê derê jî biribûn bajaroki, da ko li goristana bajaroki da,

li rex gorên bav û bavpîr û da û dapîran da, li zadigeha wî da, wî bispêrine xaka pak.

Ev qewimînan bi giştî bînanî perdeyeke reş li ber çavên Silêmanî ra di-

hatin û diçûn. Te digot qey hema du, sê rojan berî niha ev yekana qewimîne.

Li ser kevirê bêriyê rabû. Kalekela berx û mihiyên hevheşiyên bala wî li

ser xwe da rakişandin. Kesereke kûr rahêla. Baş tê bîra wî, ta çend salan

berî niha jî, ev hewşa wan tijî bû. keriyên pezên wan der û deşt tijî dikirin.

Lê betirpêrar bû, ko cerda dujmini dîsan avête ser keriyên wan û gidgidîkeke kor, kereke topal û bizineke gurî jî ji wane ra nehîştin.

Bixwe,

xwe tevgirêdabû. Li bozê dêlhine siwar bibû. Li peyê cerdê ketibû.

Lê

meta wî Rewşê çarika xwe avîtibû ber piyên hespê wî û jê daxwaz kiribû,

ko neçe. Ewî jî nikarîbû li ser çarikê ra derbas bibûya. Ev debeke mêjîn e.

Kes nikare li ser çarika jinekê ra, ko avîtibe ber piyên wî, derbas bibe.

Dibêjin her kesê ko li ser wê çarikê ra derbas bibe, çûyîna wî heye, lê hati-

na wî tune ye. Dê tendurust here û nivîşkan vegere. DYê zindî here  
û  
mirî bizivire. Silêman ji mirin û kuştina xwe netirsiyabû, belkû wî  
xwest-  
ibû bi xelkê bide zanîninê, ko qedrê meta xwe digire û keriyê qerqaş  
goriyî tayek ji porên meta xwe ya servekirî dike. Hema gava ko meta  
Rewşê çarika xwe vekiribû, havîtibû ber piyên hespê wî, bayê  
lêdabû,  
bisk û zulfên meta wî tevî hev kiribû. Zûka ji hespi peya bibû û çarika  
meta xwe ji erdê rakiribû, dakutabû, dabû serê wê û li ser oxirê  
zivirîbû.  
He li wê derê ra rast zivirîbû, çûbû ser gorina bavê xwe.

#### 14 BILÎCAN

Dîsan bînanî yekimîn rojemerga bavê wî, koma jinan li nav goristanê  
da berev bibûn û zincîrqol girtibûn û li ser gorina Eliyê Mîrî digotin  
û di-  
giriyan. Ewan xweliya dora gorina Eliyê Mîrî bi dest radikirin û li ser  
serê  
xwe da dikirin. Rûmetên xwe yên nazik didane ber pencerûskan û  
porên  
serê xwe ta tayî dirûçikandin. Dengê Gewirê li ser hemû dangan  
diket.  
Gewirê dengbêjeke bi nav û deng bû. Li giştî wê navçê da, kê derê  
şînek  
heba, dihatin Gewrê dibirin, da ko ew li ser mirî, yan kuştiyên wan  
da  
bilorîne û wawîlokan bêje.

Te digot qey Eliyê Mîrî taze hatiye kuştinê. Gewirê digot û dilorand  
û  
davîte ser Eliyê Mîrî û yê dî jî pê ra digotin û digiriyan.  
Niha ko Silêman waye li raserî kevirê bêriyê ra rawesta ye, hê jî  
dengê  
Gewirê li guçkên wî da diziringîne. Bînanî wê hindê bû, ko hema a  
niha  
ye, Gewrê vê wawîlokê bi dengêkî pir soj û awayekî pir şewat dibêje  
û  
davêje ser bavê Silêmanî:  
Wayê li minê, wayê li minê, wayê li minê...  
Şerekê li me qewimî, sibê zûka li ber beyanan...  
Hawarî daket nava gund û wan zozanan...  
Digotin gelî mêran, dujmini avît ser talanan...  
Porkurê Rewşê, dêranê Newşê hawarîke ne bi xewşî ji me ra dihat,  
dig-  
otin derbên li berî bedena Eliyê Mîrî, gula bereviyan dane, bi hevde  
tîrên  
ji kewanan...  
Hey la li minê lê dêranê wezê...  
Te digot qey hema Eliyê Mîrî taze hatiye kuştinê û Gewrê jî taze li  
ser  
cenazê wî rabûye. Dengê wê di guçkên Silêmanî da deng vedida:  
Lolo Mîro sibe bû, sibe zû bû, hîv rabibû danzde rîman...  
Hawarîke ne bi xweşî li me daket, li girê sînor, li wan çep û kîman...  
Eliyê minê delal, mîrê taze, siwarê Şevreng ji mal derket, fenanî  
caran,  
tim û timan...

De porkurê wezê, dêranê wezê, eva çendik û çend rojin, kekê Silêmanî

nazivire nav dîwanê nizam çiman...

Xelkê wenda kirine teke û tûke, ser û sûtalên malan, minê wenda kiriye

Eliyê Mîrî, kekê Silêmanî, serekê mîr û wan hakimî...

De dêranê dibêjin mîrê delal birînda re bi derbên hevde tîr û danzde ri-

man...

De Rewşê dêranê xûn dikişê ji birînên wî axayi, bînanî lûlikên lûleheng

û wan gumguman...

Evê benda dûmayîka wawîloka Gewrê li nav serê Silêmanî da deng ve-

15

BILÎCAN

dida: wan gumguman....wan gumguman... Ê tijî serê wî xûn fikir. Li nav deriyaya wan hizrana da bû, ko mamê wî Îsê Mîrî lê derket û gazî

kirê:

»Silêman tu çima îro neçûyî dîwanxana Axayi? Lê kî îro qehweya dîwanxanê digêrîne!?»

Te digot qey derbek ji derbên sûngiyên bi jehrê avdayî li sîngê Silêmanî

da daçikandin. Ta roja îro li ber apê xwe nerawestabû û xebera xwe ned-

abû ber xebera wî. Mamê wî serê wî kî alî da jê bikira, xûna wî yê li  
wî alî  
da bikişiya. Lê îro êdî nedikarî pêşayîka xwe bigirta. Li mamê xwe  
zivi-  
rand:  
»Ha te bavo daye kuştinê, ko ez herim li dîwanxana bûrayê te da  
qawê  
bigerînim? Ez niha ji te ra dibêjim, hûn ya rast nebêjin min, ezê serê  
xwe  
hildim, terkedinya bibim û li çil û çiyar bikevim. Ya rast bêjin, kanê  
ba-  
vo bi destê kê, bi pîlanên kê hatiye kuştinê. Ez ta ko tola bavê xwe  
venekim, ez nikarim li vira bimînim û bijîm. Ez êdî nikarim li nav  
çavên  
zarekê jî mêze bikim. Hem bavê min bê tol hatiye kuştinê, hem jî  
dewlet  
serê te, ez diçim ji wan kesana ra qawê digerînim, ko qawegerîn û  
misîn-  
helgirên bavê min bûn.«  
Mamê Îs we ma. Eva cara yekê bû, ko Silêmanî weha sivikatî bi  
bûrayê  
wî, ko niha bûye axayê navçê, dikir. Îsê zanî ko daye qafê wî. Zanî  
ko ew  
pîs sincirî ye. Hêdî û li ser hemdê xwe hat û li ber Silêmanî rawesta  
û bi  
zimanekî nerm û lûs, bi rûyekî vekirî, nermik nermik li ber Silêmanî  
xwend:

»Bexê minê xoştîvî! Ma ez bîhanîme? Babê te ye, birayê min e! Ez jî hê

bînanî te dilbikul û birîndar im. Tu gencekî zana yî. Tu bixwe dizanî ku,

kekî li ser talanan hatiye kuştinê û wî bixwe jî bi destên xwe tola xwe

vekiriye. Êdî hewce nîne ko ez û tu em li hizra tolvekirina wî da bin.« Silêmanî bersiv da:

»Ez jî dizanim, ko bavo li ser talanan hatiye kuştinê, lê bavo bi dexesî û

xinizî û bi pîlan hatiye kuştinê. Ez dixwazim bizanibim, kanê kê ew pîlan

ji bavo ra kişandibû?»

— Xudê ez jî bînanî te, bi min va jî reş e. Em dizanin ko dujminan havîtibûn ser keriyên me û dixwestin ko talanan bikişînin, û kekî li dû

ketibû û talan zivirandibû û çend kes jî ji dujminan kuştibû û bixwe jî

hatibû kuştinê. Êdî me hay bi pîlan û mîlanan nîne. Ya dîwanxanê jî ez

bixwe te dişînim wê derê, da ko tu çavnas bibî. Xelkê û giregiran binasî.

Di gel ridênsipî û mezinan rabî û rûnî. Eger car û baran qaweyekê jî di-

16 BILÎCAN

gerînî, ca malavayo mala xelkê ko nîne, mala xizmê meye.

Silêmanî serê xwe berdabû. Bi tûretî û li ser hev digot:

»Ez li vira namînim. Ez nikarim li vira bimînim. Ciyê ko ezê nikaribim bersiva zarekê jî bidim, ezê nikaribim li nav çavên zarokekê jî mêze bikim, ezê çawa bikaribim bimînim. Na ya min û vî welatî li hev nagire.

Ez nikarim qawegerîniya kesên dexes û gelxapîn û xiniz bikim.«  
Silêman tûre bibû. Soromoro bibû. Te xencer lêdaya çipikek xûn jê nedihat Serçavên wî bibû sêleke sora sincirî. Hema wisan serberdayî, bû

bilmebilma wî û ber bi aliyê malê çû.

Mamê wî jî wehimî. Kesereke sar rahêla û li ber lêva xwe da got:

»We diyar e, ko tiştek li ber guçkên wî xwendine! Ew waye li rê deranîne û li ser tirafan xistine.«

Bi vê gotinê ra bû nirçenirça wî û ber bi dîwanxana bûrayê xwe rê ket.

17

BILÎCAN

3

Silîv Beg, mîrekî gelhebîn û welatperwer û pir bi nav û deng bû.  
Seranserî

Kurdistana bakûr, giştî êlên; Kîkan, Mîlan, Zîlan, Sîpikan,  
Mirdêsiyan,

Şadikan, Şikakan, Reşkotan, Silîvan, Xerzan Mihemdan û  
Beraziyan... li

jêr femandariya Silîv Begi da bûn. Giştî xelkê Kurdistanê ji wî ra Mîr Silîv Beg digotin. Silîv Begi bi rewтар û kiriyar û akar û gotarên xwe,  
xwe



li dilê giştî gelê xwe da cî kiribû. Ew tim û tim li hizra rizgariya gel û fela-  
ta welati da bû. Gelek caran ewî bi arîkariya şêvirdarên xwe yên zana û  
dilsoj, şêvrên şevane dadinî û giştî serokhoz û xêlbegehên Kurdan li dîwana  
xwe da top fikir û li bara rewşa gel û welati da di gel wan diaxift û li dû  
rê û çareyekê digeriya, da ko gelê wî jî weke sedan gelên dî yên cîhanê  
bibe xudanê çarenivîsa xwe û welatê wî jî weke sedan welatên dî bibe we-  
latekî serbixwe. Wî bi hizra rizgariya welati seri dadinî ser balgî û bi hîviya  
azadiya geli çav li xewê vedikir. Ew her tim li wê hizrê dabû ko welatê xwe  
li jêr lekmên dagîrkeran derîne.  
Du kurên Silîv Begî hebûn. Ji yê mezin ra digotin; Îsê Mîrî û ji yê biçûk  
ra jî digotin; Eliyê Mîrî.  
Îsê nuxuriyê Mîrî bû. Mîrî li zaroyên xwe hemûyê gelectir hejî Îsê dikir.  
Çend berdestik û lele û mamosta û şêvirdar danîbû ber destên Îsê. Mîrî  
Îsê bi naz û neimet perwerand û gîhand. Ta ko bû xortekî gihîştî. Ca çî  
xort!...Xortekî têgiheştî û toredar, cewanakî ciwan û nazenîn û dilhebîn.

Xortekî wisan li wî derketibû, mirovî dil nedikir lê binêriya. Xortekî keşxeyî bejinziravî balaberz, li hindav da hilkişiyayî. Çavên reşbelek, birûyên kêşayî, eniya pan û vekirî, temorîka reş, bînanî perên reşdalaşan,  
dirijiya ser neitika kever. Vê rewşa wî bera her kesî li ser xwe da radikêşa.

Simbêlê reşê qeytanî li jêr difina beranî da, te digot qey bi dest kêşane. Îsê

her tim şal û şepikên Herikiyanî li xwe dikir. Kolozê Heyderanî dida serê

xwe û şeira Amedê li dorê dialand. Rişiyên şeirê dirijiyane ser kosteka

demjimêra zîvê kildayî. Gava ko xwe tev girêdida, mirovî hijmekar dima,

li bejin û bala wî binêre. Li seranserî welatî da bi sedan kiçên xame bibûne

## 18 BILÎCAN

evîndarên Îsê Mîrî. Îsê xewa gelek canik û ciwanên nazenîn herimandibû. Bi sedan kiçên mîr û mîrekan bibûne evîndarên bejin û bal û

rabûn û rûniştin û axiftin û ser û sukumê wî. Evîndarên wî li rêka destek

û navxoşîkeran peyam li ser peyamê ji wî ra dişandin:

- Bişîne xwazginî!
- Were min ji xwe ra birevîne!
- Xweziya min ji bûka bavê te hatî!
- Xwezî ez bûka bavê te bama!

— Xwezî ez bermaliya mala te bama!  
 Lê Îsê li nav wan hemû kiçên bedew û navdar da, bibû evîndarê Xecîcê.

Xecîc xûşka Emeroki bû. Emerok serokê hozeke biçûka Kurdan bû. Xecîca xûşka wî kiçeke ne hind bi pesnan bû, û ne jî hind dizêw û nehez bû. Kiçeke kina gurover, lê pir jîr û jêhatî û xûnşirîn bû. Kiçeke navincî bû. Lê birayê wê Emeroki, bibû leka rûyê wê. Digotin destê wî bi dewle- ta dagîrker ra heye. Digotin Emerok sîxurê dewletê ye. Bi sîxuriyê xwe xudan dike. Digotin pêwenda wî û karbidestên dewletê germe. Binî va hat û çûya dujmini dike. Digotin Emerok li hels û kewt û kiriyar û axift- inên Mîrî wêjara ji karbedestên dewletê ra dişîne. Li ber vê gotegotê, kerbên hemûyan ji Emeroki vedibûn. Çi rêz û sengiya Emeroki li nav gel da tunebû. Te devê kê vekira, û pirsê Emeroki jê bikira, digotin:

- Hey ewî sîxur!
- Ew binî va arîkariya dujminan dike.
- Wêjarnivîsê dewleta dagîrkere.
- Ji dujmini ra dixebite.
- Hey mala teyê, qet navê wî neyîne lo!
- Mirovên ko ji gel û welatê xwe ra dexes û xiniz bin, hêjayî pûşekê jî

nînin. Mirovên wisan tuf bikê û pişta xwe bidê.

— Ew sîxurê bê nan û xoyê? Ewê bedemek?!

— Mîrî ew ji devê dujmini deranî û kire alaka lingên xwe.

— Xudê kem mişik her çend xweliyê bikole, he davêje nav çavên xwe.

Sîxuriya wî jî he bednaviya wî ye. Ewê bi sîxuriyê çî bi Mîrî bike?

— Mirovên dexes û xiniz serê wan zêr be jî, qûna wan asinê jengoriye.

— Dexesê gel û xinizê welati, bedemeke bêbinyat e.

— Kesê ko ji gel û welatê xwe ra dexesiyê bike, nemirove.

— Qet hêjayî wê hindê nîne ko mirov li bara wî da biaxive jî.

Bi kurtî her yekê tiştê li bara wî da, li dijî wî da radigehand. Xoşîna kesî bi wî ra nedihat.

19

## BILÎCAN

Di gel van hemû derdana Îsê jî bibû dilketiyê Xecîcê. Li ser Xecîcê dilikê bibû.

Mîr bi vê hindê hesiyabû. Ewî du, sê caran li rêka berdestik û berdevkan jê ra peyam rêkiribû, ka kiça kê dixwaze, em jê ra bişînin xwazginî.

Lê Îsê di gel wê hindê ko li evîna Xecîcê da disot, her yek ji wan peyam-

nêrên Mîrî bi gotinekê ji ser serê xwe rêç fikir. Ew hê nediwêrî ya xwe û

Xecîcê eşkere bike. Lê ji mêjve bû, ko mîr li rêka xebergerînên xwe bi evî-

na wî û Xecîcê hesiyabû. Mîrî dixwest pêşdestiyê ji wî bike û navbiriye

bide wî, berî wê hindê ko ji devê wî bixwe ra derkeve, kiçeke dî ji wî ra

bixwaze. Lê bav û kur bi ya dilên hevdu hesiyabûn. Li kutaya kutayê da

Îsê gotibû:

»Bêjin bavo, bila ji mi ra xûşka Emer axayi bixwaze.«

Gava ko mîrî navê Emeroki bi Emer axayi bihîstibû, keniya bû û gotibû:

»Hê her tişt li ciyê xwe da, ca bipirsin kanê ji kengê ve ra navê Emeroki

bûye Emer axa!? Kê ew paşnava daye wî? kuro herin bêjin wî kurikî, xoşewîstê min, çavê min, jiyê min, em û Emeroki li hevdu nagirin.

He ez

herim ji te ra xûşka Emeroki bixwazim jî, gel napejirîne. Ezê çi bersiva vî

gelê nîştimanperwer bidim? Qet yekê nebêje Mîr neferin ji te ra! Te çû

xwe kire hevalê gelfiroş û sîxurekî dewleta dagîrkeri. Herin bêjinê, bila

qet devê xwe jî bi wan navane pîs neke. Em û ewana qet li hevdu nagirin.«

Peyamberan peyama peyamhinêri digîhandin peyamgiri. Lê ewî herdu

pî yên xwe kiribû solikeke teng da û digot, dibe Xecîce, nabe Xecîce. Xelk pê dikeniyar û digotin, Îsê dibêje:

Bila bûk çê be, bila kiça sê be!

Lê Mîrî digot:

»Qet vê xeberê ne hildin û ne jî danên. Rast e em hemû Kurd in û bi-

rayên hevin, lê kar û kiriyarên Emeroki ne kar û kiriyarên Kurdekî xu-

danşeref û namûs e. Dexesiya gel û xiniziya welati ne karê mêran û mirovan e. Kiriyarên Emeroki yên qilêrîn ew ji me û komela me qetandiye. Ew ne ji me ye. Em û Emerok ne ta û tûş û hevkûfên hevin.

Eger

em Xecîcê bikin bûka xwe, gelê bêje, eva jî mîrê me. Me hemûyê çavên

hîvî û umêdan kutabû Mîrî, Mîr jî çû bû xizmê welatfiroşekî wekî Emeroki. Ca hînga emê li ber çavên gelê xwe bikevin û buhayê me yê

bibe du polikên qelp. Herwisan ez naxwazim ber û binemaleya xwe jî

bilewitînim. Pêşiyên gotine; »Xwarza ji xalan e, kurûk ji falan e.«

Xwarzayên Emeroki jî dê wekî wî bin. Ez naxwazim li binemaleya min

20 BILÎCAN

da gelxor û welatfiroş rabin. Xelkê min biken nifrîname. Dê bêjin way

lê gor bi gorî, ma kiç tunebûn, ma kulpa kiçan hatibû, te çû xwe kire hevalê Emerokê gelfiroş. Ez naxwazim kordûnda bim...«

Lê gava ko heval û hogirên Îsi li bara kiçikan û zemawend û ciwan û ne-

hezan da diaxiftin û nerasterast bîr û hizrên wî li bara Xecîcê da dipirsîn,

Îsê digot:

— Ne herê, »ciwan mişene, lê xûnşirîn kit kit hene.«

Lê hindêk ji hevalên wî li bersivê da digotin:

Bahra evînê, ko hate coşê ,

Nabîne mirov li jêr serpoşê.

Ew midehek bû, ko Îsê li ber rûyê xwe da nediçû dîwanxanê û li rû Mîrî

nediket. Da ko rojekê, ko dîwanxane vala bibû, Mîrî ji kelênê wec ver-

girtibû û bixwe li ber derê dîwanxanê bi du dangan gazî Îsê kiribû:

»Îsê!...kurê min ca were dîwanxanê!«

Îsê ne ji dil û bi neçarî li dû dengê bavê xwe ra çûbû dîwanxanê û li biniya dîwanxanê da serê xwe kiribû ber xwe û rûniştibû. Gava ko mîrî li

reng û rûyê Îsi nihêrîbû. Bi tûretî weha gotibûyê:

»Kurê min ew çawa xeberin, ko tu li dû xwe dixî? Lawo em û Emerokê

sîxur li hev nagirin. Ava me û wî li coyekê da naçe. Giştî gelê Kurdistanê

wî gelfiroş û dexesê nekes ewî xinizê welatfiroş dinasin. Tu çima me dikî

hevalê mirovên gelxor û welatfiroş?! Giştî ev welatê pan û berîn li jêr des-

thelatdariya me da ye. Ka ji Xecîcê pêve tu kê dixwazî, ez heme, niha bişînim xwazginî. Kurê min, min temenek bi nav û namûs bihorandiye.

Min li dirêjaya vî temenê xwe da çî caran li dijî pûşika gel û welatê xwe

da jî dexesî û xinizî nekiriye. Ez her û her li xizmeta gel û welatê xwe da

bû me. Tu dixwazî li ser Xecokê van hemû xizmetên min, vî navê min yê

baş bidî bayê?..«

Lê hindî Mîrî li ber Îsê xwendibû, Îsê serê xwe ji ber xwe dernexistibû.

Paşî demeke xurt, ko mîr ji şîretan westiyabû, Îsê bêy bersiv ji dîwanxanê

derketibû.

Îsê jî êdî qert bibû. Dema zewaca wî bû. Da ko şevê hawarî ji Mîrî ra

anîbûn û gotibûn:

»Îsê Xecîca xûşika Emeroki revandiyê û avîtiye mala kardari.«

Bi bihîstina vê hawariyê ra, Mîr li ber kerban heftiyekê ketibû nava nivînan. Li her alî ridênsipî û nojdar û berdevk û berdestk li dora Mîrî

berev bibûn. Yê li dorê geriyabûn. Yê avêş û derman jê ra amade kiribûn. Yê jê ra dua xwendibûn. Dema ko mîr kûşkê hatibû ser hemdê

21

BILÎCAN

xwe, ridênsipî û şêvirdaran gotibûnê:

»Mîr taze kar ji karan derbas bûye. Taze tişt ko nedibû biba, bûye.



Bêhna xwe fire bike! kurê teye, karekî pir nebaş jî kiriye, lê dîsan jî he ji gunehên wî bibihore! Çavan ji gunehên wî vepoşîne!»

Mîrî bi tûretî gotibû:

»Ewî gunehêk kire du gunehan. Çû Xecoka xûşka Emeroki revand, re-vand. Bila bi qurbanî we be. Lê Xecok bire avîte mala kardari. Vêca gereke em ridênsipîyan bişînin, bila hem serên xwe ji Emeroki ra xwar bikin, hem jî ustuxwar herin ber derê neyarên me. Ez ber xatirê we jê der-bas dibim. Lê piyên Xecokê li mala min nakeve. Herin ji Îsê ra ha li biniya malan, li kolana xangevang da kuloxteykê kirê bikin û milê jinka wî ra bigirin û bavêjin wî kuloxteyî. Ez çî caran têkilî vî karî nabim. Ez evê jî îro li bal we hemûyê radigehînim. Ji îro şûn da, êdî Îsê kurê min nîne. Ez ewî ji kurtiya xwe derdixim. Ez naxwazim bi gelfiroşekî ra bibim xizim. Hûn hemû bibihên û guhdar û gowa bin, ko Îsê êdî kurê min nîne û çî xizminatiya min û Emeroki jî tune ye...«

Hindî ridênsipî û giregiran xwe avîtibûn ser dest û piyên Mîrî, Mîrî nepejirandibû.

Çend kes ji ridênsipî û giregiran bi neçarî çûbûn û qelenek dabûne Emeroki û Xecîc jî ji mala kardari siwar kiribûn û bêy dîlan û zemawend

hanîbûn, çawa ko mîrî gotibû, li biniya malan da ji wan ra kuloxteyek

kirê kiribûn û bûk û zava biribûn, li wî kuloxteyî da êwirandibûn.

Li dû wê qewimînê ra, Mîrî tewawî giregire û ridênsipiyên xwe berev

kiribû û mêvandariyeke giran danîbû.

Pêş da xelkê we zanîbû, ko mîr dixwaze kewînaşîya kurê xwe bide.

Lê

piştî xwarin û vexwarinê, Mîrî dest bi axiftinê kiribû. Ewî li dû qisedaneke dûr û dirêj ra kurê xwe yê biçûk Elî kiribû cîgirê xwe. Êdî bi

vî cureyî Îsê Mîrî li ser evîna Xecîcê, mîrtiya xwe jî ji dest dabû.

Hê du, sê salên Xecokê kuta nebibûn, ko mîr nexweş ketibû. Mîrî he li

yekimîn roja nexweşîya xwe da gazî giregirên welati kiribû û rasipardeya

xwe ya seremergê bi wan dabû nivîsandinê û gotibû:

»Her çawa ko min pêş da jî ragehandiye, kurê minê biçûk Elî cîgirê min

e. Min Îsê ji kurtiya xwe deraniye.«

Hindî giregire û ridênsipiyên lavayî jê kiribûn, Mîrî nepejirandibû.

Şêvirdar û nojdar lê berev bibûn û derman û avêşên cur be cur jê ra çêkiribûn. Lê bêçine bû. Mîrî piştî heftiyekê çavên xwe ji vê cîhana derewîn miçandibû û bi dilekî pir bi kul û birîn xatirê xwe ji gel û we-

22 BILÎCAN

lati xwestibû.

Li dû Mîrî ra li ser raspardeya wî ya seremergê, kurê wî yê biçûk  
Eliyê

Mîrî kiribûn mîr û danîbûne dewsa wî.

Ca li dû mirina Mîrî ra li bara nexweşiya wî da, bi her cureyî diaxifitin.  
Hindekan digotin, Mîr dermanxwarî kirin. Hindekan digotin Mîr li  
ber

kerban biecî. Hindekan digotin, pêpalê Xeco bû. Xeca pêpalreş!

Hindekan digotin Mîr kefozikî bû. Mîrî ew kiriyara Îsê kire dilê xwe  
û

kefogirî bû û da hinavan. Li wê bareyê da her yekê gotinek digotin  
û her

yekê ji xwe ra bi curekî dipeyvî. Bi kurtî mirina mîrî bû benîştê devê  
komelê.

Eliyê Mîrî jî çî ji bav û birayê xwe nedima. Mêrekî xudanzaxûn û  
gelperwer û nîştimanevîn bû. Ew xortekî bi dest û pê û gir û beranî  
bû.

Li bejin û bala wî û gevdê wî da çî kes li nava êla wan da tunebû.  
Xoşina

Eliyê Mîrî pir bi hespan û rav û nêçîr û hewîsanên şeri ra dihat. Ew  
tim û

tim li nêçîr û geşt û gerên çiyayi da bû. Gava ko ew kirin mîr û danîne  
dewsa bavê wî, ewî rav û nêçîr danî erdê û li dîwanxana bavê xwe  
da, li

cîhê kal û bavan da rûnişt. Lê hê sala Eliyê Mîrî û mîrtiya wî kuta  
nebibû,

ko berbangekê hawarî li wan daket. Eliyê Mîrî pêş hemûyê da li  
Şevrengi

siwar bû û li dû hawariyê ra çû û berî hemûyê xwe bi hawariyê ra gîhand.

Lê bi derd û daxên giran va, ta hawarî bi wî ra gihîşt, rastî termê wî yê bêgiyan hat.

Li dû kuştina Eliyê Mîrî ra, hê çilê wî kuta nebibû, ko rojekê siwarekî dewletê hate bajarokê wan û belavoka dîwanî bi vê naverokê belaw kir:

»Gelî hevvelatîyên hêja!

Pêdiviyê ko hûn hemû bizanibin û agadar bin, ko ji îro şûn da Emer axa mîrê navçeyê. Li ser fermana dewleta navendî, debê ko hûn hemû

mîrtiya Emer axayi bêy firk û pêş bipejirînin. Her kesê ko dijî vê fermanê

be, dê neyarê dewletê bête hejmartin û wekî dujminekî di gel bête reftar

kirinê. Ji bona pêşketin û serferaziya dewleta navendî destên xwe bidin

destên Emer axayi.

Serefraz û serketî be dewleta navendî!»

Destîne:

Kardarê dewletê Oxoz Beg

Di gel belawbûna vê belavokê, komelê weke deriyayeke tûre li ser hev

û ber hev ra pêl veda. Hatin û çûn û berevî li nîveka ridênsipî û giregirên

êlê da dest pê bû. Ridênsipiyan ro dikirin û dipîvan. Ta ko rêyekê li dijî

vê fermana dewletê ra peyda bikin. Lê her yekê tiştê digotin û yekê  
bi ya

23

BILÎCAN

yê dî nedikir. Çendîn caran berevî û şêvir danîn, lê negehîştin çi  
akamê.

Hemû carê bereviya wan bi şer û hingame jêk diweşiya. Ew çend sal  
bû,

ko hema wisan bê serwêr û rêber mabûn. Emeroki jî hêdî hêdî ciyê  
piyên

xwe vedikir. Li dû mirina mîrî ra li rex mala xwe serayek baş kirê  
kiribû û

mala zavayê xwe jî biribû û li rex mala xwe di wê serayê da cîwar  
kiribû.

Her di wê demê da bû, ko dîsan hawarî li êla Silîv begi daket, ko du-  
jminan havîtine ser talanan. De êla bê serwêr bû. Ta yekê got kurt  
û yê dî

got dirêj û ta berevî ser hev bûn û li dû hawariyê ra çûn, çi tişt  
nedîtin.

Neyaran mala Mîrî dane ber kevirê reş û pûşikek jî ji mala Mîrî ra  
ne-

hêlan. Mala Mîrî kete tengî û talî û nedariyeke sext û dijwar da.

Li dû ra Emerok jî bi destê dewletê li ser textê mîrtiya Silîv Begi  
rûnişt

û bû hemûkareyê gel û welati. Ew komela ko xwe li ber mala Mîrî  
da ser

jê dikirin jî, berebere li dora Emeroki, ko niha êdî bûye Emer axa ,  
berv

bûn. Ew komela ko amade bûn, xwe li ser mala Mîrî û Eliyê Mîrî  
bidin

kuştinê, ji dor mala Mîrî belaw bûn û berebere li dor Emer axayi  
berv

bûn. Ca roj bi rojê li hêz û desthelatdariya Emer axayi zêde û zêdetir  
dibû.

Gava ko dengê axatiya Emer axayi û bi taybetî berevbûna êlê li dora  
wî

belawî cîhanê bû, Sûsê nanpêja mala Mîrî xwe dabû ber derê kolika  
xwe

û weha gotibû:

Her ko kize, mêşan li wir vizeviz e.

Her li ser vê gotinê paşî hefteyekê mala wê ji bajaroki dane  
barkirinê.

Emer axa jî ji bo wê hindê ko devê çîrdirêjan girê bide, Îsê Mîrî kiribû  
berdevk û şêvirdarê xwe. Ca li nav xelkê da dida belaw kirinê, ko  
Axa bêy

zavayê xwe avê jî venaxo. Îsê Mîrî jî hevparê axatiya Emer axayî ye.

Xeca jina Îsê, xûşka axayi jî, bibû serdara hemû jinan.

24 BILÎCAN

4

Şev li nîviyê derbas bûye. Du par çûye, parek maye. Lê hê jî xew  
neketiye

çavên Silêmanî da. Silêman biriyara xwe girtiye. Hêdîka ji nav  
nivînan

derket. Cil û bergên xwe li ber kir. Kolozê xwe da serê xwe. Şeir û  
rişî li  
dora kulozi aland. Dolaqên xwe ko roja pêş da amade kiribû, li bin  
baligiyê xwe derêxist û li lingên xwe pêça. Çarixên xwe kire piyên  
xwe.  
Paşê xwar bû, hema wisan li tariyê da bendçarixên xwe bi ser û ber,  
gircî  
girêda û li dora paniyên xwe ra bir û anî û li pişt paniyên xwe da bi  
tew  
şidand û rabû ser xwe. Li dû ra şûtika xwe li pişt xwe aland.  
Xencera xwe  
ya tetikzîv li ber şûtika xwe ra kir. Tîr û kewanê xwe, ko darda kiribû  
hi-  
lanî. Kewanê xwe avîte milê xwe yê rastê. Tîrdanka xwe, avîte ser  
milê  
xwe yê çepê. Gurzê xwe da bin kewşê xwe. Hebana nanê xwe li pişt  
xwe  
girêda. Hêdî û hemmet derik vekir û li deriki ra derkete derê. Li ber  
de-  
riki rawesta û li dor û berên xwe û li hewale nihêrî. Hewa ewirayî  
bû.  
Nîveka esmani qelişîbû. Lê ewir weke deriyayeke pirpêl li ser hev û  
ber  
hev ra dihatin û diçûn.  
Rê ket. Li ber derê hewşê pişt xwe ra nihêrî. Bi hijmekarî li der û  
banan  
mêze kir. Destê wî ji mala kal û bavan nedibû. Lê nikarî li bin lome  
û

seteman da bima. Gelek caran ji devê zarokan bihîstibû:  
»Ewî bêxîret, nikare tola bavê xwe jî veke. Mirovên bêxîret bêbawer  
û  
dilreş in. Yezdan mirovên ko bona xweşî û hisyaneweya xwe ji xûna  
kal û  
bav û bira û kes û karên xwe, ko li rêka av û axê da hatibin gorîkirinê,  
der-  
bas bibin, nabexşîne. Her kesê ko li xûneke weha derbas bibe, xêrê  
bike  
jî, wayê nabîne. Ewan bona xweşî û hisyaneweya xwe xûna mêrekî  
bînanî  
Eliyê Mîrî danîn bin piyên xwe. Xûna wî mîrî pêpes kirin...«  
Bi van bîr û hizrane va ji devê hewşê ra derket û li dor û berên xwe  
ni-  
hêrî û li rê ket. Bi guj ber bi dervayî bajaroki lezand. Naweyeke  
wisan  
nedabû bajaroki, ko seh kir tiştêk, yan kesek li dû ra tê. Li pişt xwe  
ra  
mêze kir. Reşek dît. Gava ko baş nihêrî, nasî. Qafreş bû. Qafreşi seyê  
wî  
yê nêçîrê, dabû dû wî. Lê zivirî û hay lê kir. Lê dilê segi yê zivirînê  
tunebû.

25

BILÎCAN

Dûlka xwe hejand û xwe avîte ber piyên wî. Te digot qey seg pê ra  
hatiye  
zimani û bi zimanê bêzimanan pê ra xeber dide û dibêjê were neçe!



Silêman were ji vê oxirê bizivire! Segi dûlka xwe dihejand û xwe davîte nav lingên wî û vî alî, wî alî dorê ra dihat û diçû û xwe li ber da diqelizand.

Li dorê ra bibû turik. Te digot qey li ber digere. Lavayiyan lê dike. Lê di-  
pare. Bi kûstekûst xwe davîte ber lingên wî. Silêmanî dîsan lê hilat û pay-  
dosî dayê. Lê hê li ber çavên segi ra nedihatin. Hindî Silêmanî hay lê fikir  
û berdidayê, hind diçû ewî xwe diqelizand û xwe davîte li ber piyên wî.

Silêman neçar ma, ne ji dil, hêdîka gurzek rakişandê. Bû kûstekûsta wî.

Lê neçû. Silêmanî vê carê dîsan gurzekî dinê jî daniyê. Li vê demê da, li  
nav bajaroki dengê li ber guçkên Silêmanî ket. Li dû ra bû hêvirza san.

Qafreş ji bal wî zivirî û ber bi wê hêvirzê çû. Silêmanî li derfendê wec ver-  
girt û bi lez xwe li nepenî da wenda kir û ber bi rexê çemi şûlikî. Hê negi-  
hîştibû rex çemi, ko ew pirtîka esmanê sayî, ko li nîveka deriyaya ewiran  
ra dihate xûyanê, ew jî kete jêr desthelatdariya ewiran û hewa lap tarî bû.

Dema ko Silêman taze ji hundur derketibû, baş li ber piyên xwe ne-

didît. Gava ko bi rê va diçû, repetepeke neweke hev ji binê piyên wî di-  
hat. Lê berebere piyên wî fêre bûn û çavên wî hîmî tariyê bûn. Êdî dev û  
dorên xwe baş didîtin.  
Rojên seretaya buharê bûn. Belekî taze diketin pêsîra çiyayên beroji.  
Avên belekiyan tevî hev bibûn û ew çemê ko li rex bajaroki ra derbas  
dibû, rabibû. Çem li hev ketibû. Ta ko Silêmanî nêzîkî bi çemi kir jî,  
dengê hêvirza kûçikan her wisan berdewam bû. Lê gava ko gihîşte rex çe-  
mi, ji hurmehurma çemi pêve nikarî çî dengên dî bibihîsta. Gereke ji çe-  
mi derbas biba. Lê çem bibû xûn. Li wê şeverişê da nikarî xwe li çemi bi-  
da. Hêdî û hemmet ber bi pêpirîka bajaroki çû.  
Kaniya bajarokê wan wî alî çemi bû. Xelkê bajaroki deh, panzde ke-  
virên mezin, her yek hindî cendekê gamêşekî, rêz bi naweya gavekê dûr ji  
hev, li nava avê da edilandibûn. Ew pira bajarokiyan bû. Qîz û bûkan ga-  
va ko ava vexwarinê ji kaniyê dihanîn, li ser wê pêpirîkê ra derbas dibûn.  
Çîmenê biniya pêpirîkê jî bibû komelgeha genc û lawên bajaroki, yên ko  
taze xwe nas dikirin. Xortên bajaroki li dema bêkariyê da, li wî çîmenî da

berev dibûn û bi berhaneya leyztinê çavên xwe li qîzên bajaroki yên xame

digerandin. Qîzên bajaroki jî gava ko diçûne ava kaniyê, xwe dixemilandin. Bi gotina pîrejinan wan xwe tîtopîto dikirin û diçûn ser kaniyê.

Fîstanên xwe yên here ciwan li xwe dikirin. Xavikên xwe yên herî xweşik

û bi gulî û gulîfank û qotik û qontaz û yên rengrengî didane serên xwe.

## 26 BILÎCAN

Îca gava ko ji kaniyê dizivîrîn, cerên avê didane ser milên xwe û bi naz û

meş ber bi çemi dihatin û li ser pêpirîkê ra derbas dibûn. Ya rastî hema

mirovî dikarî bigota, ko pêpirîk bibû ezmûngeh. Lewranê eger kêmasiyek endamên kiçikan heba, gava ko li ser pêpirîkê ra derbas dibûn,

dê diyar bikira. Eger piyên kiçikekê xewşdar ba, yan kêmasiyek dî li en-

damên wê da heba, nikarî baş li ser pêpirîkê ra derbas biba. Yan jî eger

kiçek hûşt-hûştokî ba, dîsan gava ko li ser pêpirîkê ra derbas dibû, diyar

dikir. Gelek gencên bajaroki he li ser rêka kaniyê di gel kiçikan nasiyar

dibûn. Çîmenê li rex pêpirîkê bibû meydana leyza lawan. Genc û law û

zaroyan hemû rojan, bayê êvarê, ko dema bêkariyê bû, li wî çîmenî  
da di-  
leystin. Leyzên weke holanê, qalanê, darçîtan, qilçanê, topşeqanê,  
biranê  
û bi dehan leyzên dî. Lê leyza ji hemûyê giringtir, ko gelek caran  
mêran  
jî ew leyza dikirin, guleşanê bû. Heftiyê rojekê ew çîmena dibû  
meydana  
guleşanê. Gencên giheştî li meydanê da kom dibûn û carê yek ji wan  
di-  
hate meydanê û xenîmê meydanê dixwest. Gencan li wê meydanê  
da gu-  
ja leşê xwe nîşanî hevdu didan. Silêman jî eva çend sale, ko ketiye  
nav ko-  
ma guleşgiran da.  
Silêman giheştibû rex pêpirîkê. Ew rojên ko wî li vê meydanê da  
guleşanê digirt û giştî nîşteciyên bajaroki bi jin, zar, kal, pîr, qîz û  
bûkên  
bajaroki va derdiketin temaşê, anî bîra xwe. Ew rojên ko Silêmanî  
xenîmên xwe li erdê didan û li vê leyzê da derdiket. Ew xweşî û  
gulşayiya  
bajarokiyên, hemû li ber çavên Silêmanî ra derbas bûn û Silêmanî  
bo de-  
meke kurt her tişt ji bîr kir. Lê hurşehurşa ava çemi, ko bi guj li  
kevirên  
pêpirîkê diket û li ser ra davît, hevo û firêtên bîr û hizrên Silêmanî  
pizirand. Bera wî kete pêpirîkê. Avê li ser pêpirîkê ra avêtibû.  
Hurşehurşa

avê bû, ko wekî dînan serê xwe vî alî, wî alî li kevir û kendalan dida  
û bi

hawar û gazî rêya xwe vedikir û pêş da diçû. Tenê serê kevirê ji  
kevirên

pêpirîkê dihate xûyanê, ko pêlên avê carê carekê lê didan û ew jî  
wunda

dikirin. Silêmanî xwe ji xwe ra got:

»Çi nake ezê herim li ser pirê ra derbas bibim. Rêya min hindekî dût  
dikeve, lê çi nake.«

Silêman kete rex çemi û hevraz ber bi pirê çû. Bajarokiyên hemû  
salê

derbuharê, gava ko ava çemi radibû û pêpirîk li jêr avê da dima, du  
dar li

rex hevdu da dadinê ser kendalê fêza pêpirîkê û dikirin pire. Xelk  
li ser

wan herdu darane ra derbasî wî alî çemi dibûn. Ta ko çemi didanî,  
dîsan

ew herdu dar radikirin û dibirin. Zaroyên bajarokî ji wê pirê ra  
digotin;

pira darîn.

27

BILÎCAN

Silêmanî xwe gîhande pira darîn û piyên xwe bi hemmet danî ser  
daran

û li ser ra derbas bû. Dar li bin piyên wî da dihejikîn. Gava ko li çemi  
bi-

horî, berê wî kete girê pêşberî malan. Di bêhnekê da li ser hevrazê giriki ket. Gava ko gihîşte serê giriki, bêhemdê xwe zivirî, li bajaroki û li der-banan nihêrî. Bajarok bînanî termekî giran li bin reşatiya şevê da veleziyabû. Bi zorê karî li tariyê da reşê derbanên mala xwe û mala apê Îsi binase. Bixwe jî nizanî çima nikare çavên xwe ji wan cotên derbanan hilîne. Demekê mat ma. Hema wisan li tariyê da li derbanan nihêrî. Paşê bêhemdê xwe li pişt giriki da qulubî. Dema ko li pişt giriki da diqulibî, dîsan hêvirze kete nava seyên bajaroki. Bû zûrezûra wan. Te digot qey tiştêk li bajaroki qewimiye. Dilê Silêmanî gelekî dixwest, ko bizivire, li bajaroki mêze bike û hegera wê hêvirzê bizanibe. Lê, berjêr li ser newalê da şûlikî. Li ser du, sê belekiyan ra derbas bû. Berf nerm û tenik bibû. Xişêna berfê bû, ko li ber piyên wî dişiqitî. Hê rêyeke wisan neçûbû, ewir û esmanên ko pêş da berevî ser hev bibûn, tarîtir bûn. Nermebayekî hênik vizandê û yekimîn berjenga baranê gepka rûmetê Silêmanî ramûsî. Silêman ew çiya û gelî û newalane hemû bînanî kefa destê xwe nas dikir. Lê cîhan wisan reş û tarî bibû, ko mirovî nikarî baş li ber piyên xwe

bidîta. Demekê rawesta û li dor û berên xwe mêze kir. Baranê dest  
pê  
kiribû. Bi guj dibarî. Nişkava hate bîra wî, ko li binê newalê, aliyê  
rastê,  
kûleyek heye. Dibêjine vê kûlê, kolika Mîrzo Kizo. Ber bi kûlê zivirî.  
Barana guj, gujtir bibû. Silêman bi taw kete ser berjêri û xwe li ber  
devê  
kûlê ra gîhand. Baran bînanî lûlka lûlehengan dibarî. Te digot qey  
pîrefelekê kûzkê ava xwe serberjêr kiriye. Gava ko giheşte ber derê  
kûlê,  
tirpetirpa dilê wî bû. Hewa hind reş û tarî bû, te digot qey dewsa  
avê qîra  
reş dibare. Erd û esman bi hev va hatibûn dirûnê. Li ber derê kûlê  
rawes-  
ta û li dilê xwe da got:  
»Eva jî kolika Mîrzo Kizoyi.«  
Gava ko navê kolikê û navê Mîrzo Kizoyi anî, sawê ew girt. Tirsê  
wekî  
kundekî kor penc li dilê wî da çikand. Hema wisan li ber derê kûlê  
ma.  
Nediwêrî daketa hundurê kûlê.  
Ev kûla, cîhê kotiyên bû. Silêman li ber derê kûlê rawesta û kûr  
ponijî:  
Erê, kotîbûn! Nexoşiya kotîbûnê bila nekeve nava çî mal û binemal  
û  
gel û welatekî da. Nexoşiya kotîbûnê nexoşiyek pir pîs bû. Rast e  
niha

hindekî rehbiriyayî bûye, lê hê jî li nav hindek mal û binemal û hoz  
û

gelan da maye...

Nexweşiya kotîbûnê nexweşiyeke vegir bû. Eger li bajarekî, yan li  
gun-

28 BILÎCAN

dekî, yan li malekê da yek kotî biba, li maweyeke kurt da nexweşî  
ya xwe

berdida yên dî jî. Ca giştî xelkên wê malê, yan wî gundî û bajarî kotî  
dibûn. Hemûyê pirzikên zer derdixistin û ava zer ji wan diza. Gava  
ko

yek li navça wan da, ba lê bigeriya, kotî biba û çî derman jê ra peyda  
neki-

rana, neçar diman, ew nexweşa dihanîn, davîtin nava vê kûlê da, ta  
ko

nexweşiya xwe bernede yên dî jî. Vêca dan bi dan xwerekî wî  
nexweşî di-

hanîn û didanîn ber derê kûlê û paş da dizivirîn. Paşê ew nexweşa  
dihat

û xwerekî xwe dibir. Eger havîn ba, mêş û moz li ser birînên wan  
nexweşana berev dibûn û li maweyeke kurt da, kurmî dibûn û zindî  
zindî

ker ji leşê wan diketin. Gelek ji wan nexweşan du, sê mehan zêdetir  
tab

nedihanîn û li binê kûlê da yan li ber tundbûna nexweşiyê, yan jî li  
ber



kerb û bêhedûriyê dibiecîn û dimirin. Û paşê gundî û hevheşiyar  
paç û  
pîne li ser û guhên xwe dialandin û berdevk didane ber devên xwe  
û bi  
bêr û mer û tevir û paçan cenazê kurmîbûyî ji kûlê derdixistin û  
dibirin  
çal dikirin û dihatin.  
Nexweşiya kotîbûnê nexweşiyeke pir pîs e. He li ber wê hindêye ko  
pêşiyar şerên xwe bi xwetiyê jî wekendine vê nexweşiyê û gotine:  
»Şerê  
xwe bi xwetiyê, rîşa kotîbûnê ye.«  
Nexweşên weha li wê navçê da gelek bûn. Yek ji wan jî Mîrzo Kizo  
bû.  
Mîrzo Kizo kotî bibû. Çunkû çî derman ji nexweşiya wî ra peyda  
nebibû,  
xizm û kesên wî neçar mabûn ew hanîbûn avîtibûn vê kûlê da.  
Berewajî  
hemû nexweşan Mîrzo Kizo çend salan li vê kûlê da mabû. Paşê lap  
qenc  
bibû û zivirîbû mala xwe. Hîngava navê vê kûlê kiribûn kolika Mîrzo  
Kizoyi. Mîrzo Kizo li binê kûlê da ji xwe ra bi keviran kolikeke biçûk  
çêkiribû. Pê pûş û pelaşan ji xwe ra doşikek serast kiribû, ko şev û  
roj li  
ser wê radiza. Digotin, Mîrzo Kizo hema wisan xorayî qenc nebibû  
ku.  
Ew li şevên buharê, li ber hîveronan derdikete derva û pincarên cur  
be  
cur berev dikir û hem ew pincarane dixwar, hem jî didanî ser birînên

xwe. Digotin hema ev pincaran bûn heger, ko Mîrzo Kizo ji derdê kotîbûnê rizgar bibe.

Silêmanî li ber lêva xwe da got:

»A, ji derdê kotîbûnê ra jî derman peyda bûye, lê ji xiniziya me ra hê na...«

Li nava van bîr û hizrane da sawê ew girtinbû. Dilê wî bi tundî lêdida. Tirpetirpa dilê xwe dibihîst. Her çend ko ew xortekî biwêr û dilêr bû, lê

gava ko navê kotîbûnê û serhatiya kotiyar hate bîrê, lertzê ew girt û newêrî dakeve hundurê kûlê. Lê baranê ew pir şepirze kiribû.

Şureşura

29

BILÎCAN

avê bû, ko ji bejna wî dikişiya. Xwe ji xwe ra got:

»Teeş! Min çî ra Qafreş bi xwe ra neanî. Xwazî min Qafreş bi xwe ra bianiya. Bêzîmani bixwe dixwest bi min ra bê, lê min para berdayê...«

Kûle hind dûrî bajaroki nibû. Wakî hindî hêz û tawa wî hebû, bikira gazî, hema du, sê dangan gazî Qafreşi bikira, Qafreşê li peyê dengê wî ra

bihata. Lê wakî gazî bike û dengê wî li ber guçkên apê wî bikeve, çî? Hînga apê wî yê komek şopgerîn hilde û şopa wî bigerine û li dû ra bê

û ewî peyda bike û bigre, bibe. Êdî ewê li nav gel û welati da bibe polekî

bi pênc peran.

Li nav van hizrana da cûm bibû. Lê dîsan xwe ji xwe ra got:  
»Eger li dû dengê mi ra bên jî, nikarin li vê şevereşa birqetav da, min  
peyda bikin.«  
Dil û cergê xwe kire pola û xwe da ser berê li ser devê kûlê û bi du,  
sê  
dengan hindî hêza wî hebû, gazî Qafreşi kir.  
Baran jî hema wisan dibarî. Cilkên wî lap ter bibûn. Lê dîsan jî nedi-  
wêrî biçûya hundurê kûlê. Li ber derê kûlê xwe da ber pesêva  
kevirekî û  
çavnihêrî Qafreşi ma. Li wê demê da, bû pirîna firindeyekê û li ber  
çavên  
wî ra firî. Serê baskê firindê hemmanê li difina wî ket. Diqewime ko  
baskê firindê li difina wî neketibe jî, lê ewî wisan seh kir. Careke dî  
jî  
hindî hêza wî hebû, gazî Qafreşi kir. Hê dengê wî li gewiriyê da bû,  
ko  
kûstekûsta Qafreşi li serê girê nîveka xwe û bajaroki da bihîst. Bi  
dengê  
Qafreşi ra giyan kete ber bedena Silêmanî. Hêdîka, li nava dev û  
lêvan da,  
du, sê dangên dî jî gazî Qafreşi kir.  
Qafreş bi şelpetelp hat û li ber wî rawesta. Qafreş serdanpê li avê  
da  
cûm bibû. Diyar bû, ko xwe li çemi daye û baranê jî ser da lêkiriye.  
Gava  
ko gihîşte Silêmanî û çav bi Silêmanî ket, kire kûstîn û dêla xwe  
hejand û

xwe bijbijand. Ava leşê Qafreşi tevî ava baranê bû û peşkiya ser çavên

Silêmanî.

Bi hebûna Qafreşi ra, te digot qey Silêman bûye xudan û serokê leşk-

erekî girane çekdar. Bê tirs û saw li ber baranê, dakete kûlê.

Hundurê

kûlê hişk û zuha bû. Pala xwe da dîwarê kûlê. Bêhna xweliya hişk û pûş

û pelaşên rizî ji hundurê kûlê dihat. Dîwarê kûlê tevizî bû. Li Silêmanî sar

bû. Xwe li ber dîwarê kûlê hindekî wêda da. Şurîna avê bû, ji ser û kincên

wî dikişiya ser kevirê nava kûlê. Hundurê kûlê wekî dojeheke sar, tarî û

tevizî bû. Silêman demekê hema wisan li nava kûlê da rawesta.

Nizanî yê

çi bike. Derva baran bi guj dibarî. Bi pêxişik ji hundurê kûlê ber bi devê

wê çû. Li ber devê kûlê kûşkê serê xwe derxiste derva û li baranê nihêrî.

30 BILÎCAN

Şingîna baranê bû. Derva hê ji hundur jî tarîtir bû. Baranê weke tayên

reş, erd û esman bi hev va dirûbû. Cîhan bibû deryayeke reşe tarî.

Dilê

Silêmanî dişewitî. Dixwest xwe ra rûnê û di gel ewir û esmanan  
rondikan  
bibarîne. Lê quretiyê ew rêka nedida wî. Ji xwe, ji mêraniya xwe, ji  
navê  
xwe şerm dikir. Rast bû ko ew gencekî tazegiheştî bû. Lê ta roja îro  
kesî  
piştta wî danenîbû erdê. Ev e demanê çend salan e ko ne tenê genc  
û lawên  
hevtemenên wî, belkû mêrên qert jî, kesî ji xwe ra nedidît, di gel wî  
milmilanê bike. Ca mêrekî wisan, xortekî wisan, çawa dikare ji ber  
ser-  
hatî û qewimînên cur be cure cîhana xapxapok bigriya. Lê dîsan jî  
dilê wî  
dişewitî. Dixwest rûnê û têt bi dil û can rondikan bibarîne.  
Teratiya cilikan da leşê wî. Sermayê lê kar kir. Dilê wî dixwest, ko  
leşê  
xwe bide ber agirekî gur û xwe têt germ bike. Lê li wê şevereşa  
birqetav  
da, yê ardû li kêderê bihaniya. Heste û kevirhestên wî li kûrika wî  
da bûn.  
Destê wî bêhemdê wî kete ser tetika xencerê. Xencera tetikzîv li ber  
piştê  
ra bû. Gelek caran gava ko diçû geliyi nêçîrê, bi vê xencera xwe  
gwînî  
diçînî. Her çend ko dizanî, derva bûye deriyayeke avê, lê dîsan jî bi  
van  
bîreweriyana ra, bi hîviya peydakirina ardû û hilkirina agirekî germ  
bi

pêxişik ji kûlê derket. Derva hê ji hunduri jî tarîtir bû. Ber piyên xwe  
ne-  
didît. Xwe bi dîwarê kûlê va girt û kûşkê pêş da çû.  
Li ber derê kûlê lingê wî li tiştekeasê bû. Li ser da likumî. Hindik  
mabû  
deverû li erdê biketa. Lê xwe girt. Dîsan bi hemmet lingê xwe li wî  
tiştî  
da. Dirikên gwîniyî li lingê wî ra çûn. Gwînişeyekî mezinî bi reh û  
rîşal  
li ber derê kûlê li pesêva layê beroji da tûr vedabû. Bi peydakirina  
gwîniyî  
ra şa bû. Pê piyên xwe gwîni serobin kir. Dest avîte xencera xwe û  
xencer  
ji kalani kişand. Pê piyên xwe rexe gwîniyî bi hemmet bilind kir û  
li ser  
da qet kir. Hêdîka li ser gwîniyî da xwar bû. Destê xwe yê çepê hêdî  
lep-  
and û rîşala gwîniyî peyda kir û devê xencerê li gewriya gwîniyî  
hesikand.  
Piştî demekê gwîni li bini da birî. Ta ko gwîni birî, du, sê dirikên  
gwîniyî  
li piştta destê wî ra çûn. Li tariyê da destê xwe kire devê xwe û bi  
zimanê  
xwe li dirikên ko li piştta destê wî ra çûbûn, geriya. Dirik bi zimanê  
xwe  
peyda kir û bi didanên xwe ew yeko yeko ji piştta destê xwe deranî  
û danî

ser zimanê xwe û tufî erdê kir. Paşê hema wisan gwînî danî erdê û  
xencera  
xwe dîsan li kalanê wê da cî kir û li dû ra pê kefa destê xwe yê çepê  
pişta  
destê xwe yê rastê mizda. Dewsa dirikan şewitî. Silêmanî li ber derê  
kûlê  
du, sê caran bi taw gwînî dakuta. Paşê gwînî hilda û bi pêxişik  
dakete nav  
devê kûlê û gwînî li nîveka devê kûlê da danî erdê û ew pêpes kir û  
li ser  
hev da civand. Lê gwînî gelekî ter bibû. Av jê dinuqutî. Tişteke kete  
bîra

31

BILÎCAN

Silêmanî. Silêman bi pêxişik hêdî hêdî ber bi binê kûlê şiqitî. Xwe bi  
dîwarê kûlê va girt û destê xwe leband. Xişêna pûş û pelaşên rizî li  
ber  
piyên wî hatê. Hêdîka xwar bû û hindek pûş ji erdê berev kir. Pûş û  
xwelî  
teví hev bibûn. He karî tijî mista xwe pûşê rizî berev bike. Bêhna  
xweliya  
hişk û pûşên rizî da serê wî. Dîsan bi pêxişik ber bi devê kûlê layê  
gwîniyî  
çû. Gava ko zanî giheştiye gwîniyî, pûş danî erdê. Li dû ra destê xwe  
avîte  
kûrika xwe û hebanokek, ko devê wê pê bendekî helboqe girêdabû  
û serê

bendiki jî avîtibû doxîna xwe, ji kûrika xwe deranî. Helboqa derê hebanokê vekir. Du kevirê sipî û hindek pîşo jê deranî. Pîşo danî ser ke-  
virekî û bi kevirê dî hêdîka û bi hemmet lêda. Du, sê caran li ser hev ke-  
virheste jenî. Xwe li ser kevirheste û pîşo da tewandibû. Wisan hemmet  
dikir, te digot qey kotirek li nav lepên wî da ye û naxwaze ew kotire li nav  
destên wî da derkeve û bifire hewa. Paşî du, sê caran ko kevirheste li ser  
pîşo li hevdu jenî, peşqelên hûr ji ber firîn. Li ber ronahiya peşqelan Silêmanî karî kevirhesteyan li nav destên xwe da bibîne. Gava ko peşqe-  
lan da nav çavên wî, xwazîka wî ji bo agirekî gur zêde û zêdetir bû. Bi gef  
û gur lê bi hemmet kevirheste jenî. Paşî çend caran di gel peşqelên ke-  
virhesteyi dûkeleke şîne zirav ji ser pîşoyi rabû hewa. Dûkel çû çavên wî.  
Du, sê hêsirên zirav, ew hêsirên ko demekê berî niha dixwestin ji zindana  
çavên wî derkevin û ji wê rikeyê rizgar bibin, li ser tefeşa wî da şûlikîn.  
Li ser kevirhestê binî, li nav destên Silêmanî da koziyeke biçanok çê bibû. Silêmanî hêdî û li ser hemdê xwe, wisan ko pîşo ji cî neleqe, nermenerm pufî wê koziya biçûk kir. Kozî berebere geş bû. Paşê koziyê



pê girt û gur bû û alaveke biçûk li ser kevirhestê binê çê bû. Silêmanî  
hêdî  
û hemmet, hema wisan ko li cî da rûniştibû, ew koziya biçûk danî  
bin  
pûş û pelaşên rizî. Alava biçûk li nav pûş û pelaşan geriya û bû  
qirçeqirça  
pûş û pelaşan. Pûşên rizî kozî girtin. Li dû ra Silêmanî gwînî jî danî  
ser  
pûşan û nermik nermik puf kirê. Paşê destê xwe avîtê û li binê  
hebanokê  
da hindêk pîşoyên dî jî deranî û danî li ser pîşoyê kozîgirtî. Dîsan  
hêdî  
hêdî puf kirê. Gurîkên pîşo li nav qetên pûşên rizî ra derbas bûn û  
xwe  
gîhandin çiqilên gwîniyî û hêdî hêdî li nav çiqilên gwîniyî ra jî derbas  
bûn. Dûkeleke zirav li nav qetên gwîniyî da lev geriya. Li dû ra dûkel  
hêdî  
hêdî bilind û bilindtir bû. Li jêr dûkelê ra alaveke zere zirav serê xwe  
ji nav  
dirikên gwîniyî ra derxist. Alav berebere mezin û mezintir bû. Bû  
qirçe-  
qirça gwîniyî. Gurî bilind û bilindtir bû, û bû guriyeke mezin. Layekî  
gwîniyî li ber pesêva kûlê da hindêkî hişk mabû. Lê layê dî te digot  
qey li  
nav avê ra kişandine. Çizeçiz bi wî layê gwîniyî yê ter ket. Alavên  
agiri de-

32

ma ko li ser wî aliyê ter da diçûn, bi hêvirze paş da dizivîrîn. Dibû  
çizeçiza

avê û berdida alavan. Alav li ber avê direvîn û li ser layê dî da qet  
dibûn.

Li wî rexê gwîniyî da leşkerên agiri li ber xoragiriya leşkerên avê  
paşekiş  
dikirin.

Silêmanî li ber xwe da got: »Lewranê pêşiyar gotine: Li hev bûne av  
û  
agir.

Alava gwîniyî bilind bû û da pêşîra kûlê. Nîvê kûlê ronahî kir.  
Silêmanî

kevirheste û pêşo dîsan kire nav hebanokê. Derê hebanokê dîsan pê  
bendê wê helboqe girêda û hebanok dîsan kire kûrika xwe da.  
Şivanê wan

Qicoyê Kalê, jê ra ev hebanoka pê kevilê berxeke virnî çêkiribû. Qico  
li

çêkirina van hebanokan da hosta bû. Ewî bixwe ji van hebanokana  
ra

kîsik digot. Lê çunkû ewî ew kîsikan bînanî hebanan çêdikir, xelkê ji  
wan

kîsikan ra hebanok digotin. Belengazê Qico çar, pênc salan berî  
niha,

hema li ber pezî birûskê lêda û kuşt. Ta hawarî pê ra gihîşt, Qico can  
dabû jî. Birûskê lêdabû, rexeke serê wî, temorîka wî ya reşe qurûşkî  
kuzu-

randibû. Kalêyê bavê wî, nehîşt termê wî bînin nav goristana  
bajaroki da

çal bikin. Ewî hema li cîhê ko birûskê li Qicoyi dabû, jê ra gorinek ko-  
labû û ew li wê derê çal kiribû. Ewî digot: kurê min cangorî ye. Ca her sal  
durust li roja ko birûskê li kurê wî dabû, bi jin û zar û kes û karên xwe va  
diçû ser gorina kurê xwe û rojemerga wî bi bîr dihanî.  
Silêman li nav van bîreweriyana da bû, ko li ber ronahiya agiri pirtepiirt  
kete nav pelçermokên pêşîra kûlê û lev zivirîn. Agir lap geş û xweş bibû.  
Silêmanî pêş da pêşîr û navpêşîra xwe da ber agiri. Agiri da nav çavên wî  
û rûmetê wî yê sar bûyî germ kir. Silêmanî li dû ra kolozê xwe ji serê xwe  
rakir. Du, sê caran ew bi taw dakuta. Ava kolozi peşikiya ser agiri. Çizeçizeke tund ji agiri rabû. Li dû ra serê xwe li ser agiri da bijbijand. Porên xwe li ber agiri hişk kir. Paşê derlingên şalê xwe jî da ber guriyan.  
Li dû ra jî qasekê pişt û teniştên xwe li ber agiri germ kir. Qafreş jî bînanî hevlekî li rex Silêmanî ketiye. Tu dibêjî qey ew jî li ber guriyên agiri xwe germ dike. Li ber agiri ketibû û serê xwe danîbû li ser herdu lemên xwe û çavên xwe kutabûn nav çavên Silêmanî. Silêman jî dîna xwe didayê. Hema bînanî niha tê bîra Silêmanî, dema ko ev Qafreşa

tûleyekî biçûk bû, wisan xweşkok û dilhebîn bû, ko te dil nedikir, tu çav jê hilînî. Hind cindî bû, mirovî dil hebû ew bikira nav dilê xwe da. Her kê ew bidîta, gavekê li ber radiwesta. Çavên xwe dikuta li nav çavên wî da û çûr dima lê mêze dikir. Nanpêja wan Sûsê, gava ko çav bi Qafreşi diket, pê ra şa dibû û digot:

33

BILÎCAN

»Ay Xudêyo çende xweşkok e, tu dibêjî hema nasirokê min e.«  
Nanpêja wan ji Aranê bû. Nasirok navê nebiyê wê bû. Her sal havînan dema ko kar û bar pir dibû, Sûsê û kalemêrê wê Amû, Nasirok û zarên xwe yên dî hemû cî da dihêlan û dihatin bajaroki û li nav mala Mîrî da dixebitîn û payîzan jî barê rûn û penîr, keşk û jajî û elegez û sipîpincar û lûşê û tirşoya ga û pincarên cur be cure beyanî ji xwe ra dadigirtin û pêkve dizivirîne mala xwe. Da ko rojekê mêrê wê li şerekelanê da kete nav dest û piyên kelên hozîbûyî da û ta ko kelevanan ew li nav dest û piyên kelan da deranîn, li xûnê da mabû. Pîl û parxanên wî xişibîbûn. Her çend

şikestebendên bajaroki qîr û çekem û benîşt û hingivîn kişandin pîl  
û  
parxanên wî, lê bêtune bû. Da ko sibêdeyekê bi hawariya Sûsê ra  
komel  
rastî termê bêgiyane Amû hatin. Belengaza Sûsê bona kalemêrê  
xwe her-  
du lacankên xwe ta binçênê bi çengan dirandibû. Porên serê xwe ji  
bona  
mêrê xwe loç kiribû. Piştî mirina Amû Sûsê êdî nezivirî Aranê. Ewê  
hema  
serê xwe bi Tajdînê mîrav ra kire yek û bi wî ra zewicî. Tajdîn li wê  
demê  
da ko mîravê mala Mîrî bû, serwêriya hemû rênçberên mala Mîrî jî  
dikir.  
Piştî hînga Sûsê êdî he li nav mala Mîrî da ma. Daku Emer axa hate  
ser  
kari û mala wê belengazê jî he li ser yek gotina pêşiyên ji bajaroki,  
da  
barkirinê. Sûsêya ko kurên wê çendîn caran hatibûn peyê û neçûbû,  
vê  
carê bi destê zorê û bi neçarî, kor û poşman Tajdîn cî da hêla û li ser  
kurên  
xwe da zivirî.  
Sûsê her dem Qafreş diwekende nebiyê xwe û digotê:  
»Ay, qeda te li min keto, tu dibêjî hema Nasirokê mine. Çende ciwan  
e xudêyo! Weke Nasirokê min şîrîn e.«  
Gelek caran jî gava ko Sûsê xwe û Qafreş tenê bidîta, dûrî çavên  
komelê

ew dida bersîngê xwe û maçê dikir. Carekî Silêman li ser da çûbû,  
Sûsê jê

pirsîbû:

»Heram nîne ne ?«

Silêman bersiv dabû:

»Ne, e!«

Ev e razeke mezinê siruştê ye. Biçûkên her ajalê weha dilhebîn û  
xweşkok û berdilan dibin. Têjkên pişîkan, tûlên sagan, golikên  
çêlekan,

berx, kar, kudikên hirç û berazan, heylo têjkên kûsel û jûjiyan jî  
weha

xweşik û dilrakêş dibin. Erê eva razeke sergirtî û mezinê siruştê ye.

Siruştê

ew ciwantî û balrakêşiya kiriye leşên van biçûk û têjikan da, da ko li  
saya

vê ciwantiyê da evîn û hejîkê biafirîne û li saya wê evîn û hejîkê da  
jî ew

biçûk û têjik û tûlana li her cure buve û hirêşên dirindane rizgar  
bibin.

34 BILÎCAN

Digel vê hindê dîsan jî, zor ajalên dirinde û herwisan jî hindek  
mirovên

dilkevîr hene, ko wan jî xwendeya xwe li ber wan dirindan  
vergirtine, van

biçûk û têjikên xweşkok, her tenê ji bo têkirina zikên xwe, yan jî ji  
bo

pêxoşiya serkirdeyên xwe, dikojin û xûna wan dirijînin û tûşî vî  
gunehê

mezin û nebihorandî dibin.

Qafreş jî hema bînanî hemû biçûkên giyanliberan gelekî ciwan û dil-  
hebîn bû. Xoşina hemûyê lê dihat. Lê xoşina Sûsê û Silêmanî ji ya  
hemûyê gelectir bi wî ra dihat. Niha jî hema ew hejîkirina pêşîn di  
dilê

Silêmanî da ma ye. Dema ko Qafreş tûle bû, Silêmanî bixwe dan bi  
dan

xwerekî wî li dandûra wî da didayê. Sûsê jî her dem kûtê genimî û  
çivir

ji wî ra dipat. A, gava ko Qafreş hê tûleyekî zor biçûk bû, taze çavên  
wî

bişkivîbûn û taze bi rê va diçû, Silêmanî bixwe jê ra şîrê bizinan didot  
û

berdida kodika wî da. Bixwe jî li ser ra radiwesta û li şîrçelpandina  
wî

temaşê dikir. Gelek caran ewî Qafreş dida ber sîngê xwe û dibire  
nav

hevalan û kîşkîşî hevalan dikir û ew hûreyî dirbûnê dikir. Niha jî  
Qafreş

bi herdu çavên xwe yê zere zeytûnî, ko bînanî du matan li korika  
çavên

wî da direqisîn, li ber Silêmanî ketiye. Diqewime, ko ew jî wan  
rojana

dîne bîra xwe û li wê bîreweriyê da dijî. Kê çî dizane? Gelek razên  
cîhanê

hê sergirtî mane...

Silêman li kiriyarên xwe yên çend demhejmêrên berî niha poşman bû.

Kastîna Qafreşi, dema ko Silêmanî ew da ber derbên gurzan, li guçkên

Silêmanî da deng veda. Hêdîka li ber lêva xwe da navê wî anî û mûçandê.

Reheke lavayîkerane li dengê Silêmanî da diyar dikir. Qafreşi dêla xwe

hejand û serê xwe li ser herdu lemên xwe rakir û yek alî li Silêmanî nihêrî.

Bi qirçeqirça reh û rîşalên gwîniyî ra, hevo û firêtên bîr û hizrên Silêmanî ji hevdu pizirîn. Agir ber bi temirînê diçû. Li rex agiri rabû ser

piyan û şalê xwe ji sotikên gwîniyî, ko peşkiyabûne ser da, dakuta. Li dor

û berên xwe nihêrî. Her der tarî bû. Hebana xwe li ser sîngê xwe serast

kir. Kewanê xwe avîte milê xwe. Tîrdanka xwe jî li ser milê xwe yê çepê

da cî bi cî kir. Gurzê xwe da destê xwe û bi pêxişik ber bi devê kûlê çû.

Derva hewa hê jî tarî bû. Pêş da nikarî baş li ber piyên xwe bidîta. Lê paşê

berebere çavên wî hûre bûn û ji kûlê derkete derva.

Baran jî êdî bend bibû. Êdî ewiran xwe ji hev berdabûn. Nîveka esmani

qelişîbû. Tekoteko istêrên bêreng li wê navê da dibiriskîn. Istêran rengê



xwe derdabûn.

Hêdî hêdî dakete binê geliyi. Şureşura avên belekiyan bû. Baranê lap

vekiribû. Sira paşî baranê êm bibû. Bibû nermebayekî sar.

Hurşehurşa

35

BILÎCAN

avê bû, ko bînanî dîneke sermest dihurmicî û serê xwe li dar û ber  
û ke-

vir û kendalan dida û ber bi binê geliyi diherikî. Hindî ko Silêman li  
geliyi da berjêr diçû, hind diçû ava geliyi zêde û zêdetir dibû. Ava  
geliyi

hêdî hêdî rengê çemekî dida. Li her layan ra cok û cobar, li dere û  
tîşik û

herd û newal û gelî û kendalan ra ber bi çemi dikişyan. Li ber  
hurme-

hurm û hurşehurşa çemi, Silêmanî çi tişt nedibihîst. Hema serê wî  
di ber

da bû. Bi lez û gef û gur pêngav dihilanî û di gel çemi berjêr dibû û  
pêş

da diçû. Te digot qey li dû ketine û ew li ber kesekî direve. Hindî  
diçû

rewta wî rengê helatinê dida. Qafreş jî hema wisan li dû wî ra  
diloqiya.

Pişt xwe ra li Qafreşi nihêrî. Reşatiya li serçavên Qafreşi li tarîmariya  
şevê

da pê va hate xûyanê. Bi wê yekê ra zanî, ko sibêde waye nêzîk dibe.

Serçavên Qafreşi bînanî kûtekî şewitî reş û qimer bû. Hêleke reşe qimer

ji limozê wî ra dest pê dibû û li patika wî li navmilan ra, durust li ser mazîpiştika wî ra derbas dibû û ta serê dûlka wî didomand. Mirovî digot

qey ew hêla bi dest kişandine. Hema li ber vê reşatiya serçavên wî bû,

bona vî rengî bû, ko navê wî danîbûn Qafreş. Pirça Qafreşi wisan geş û

hulo bû, te digot qey şe kirine. Dema ko leşê wî hişk ba, rewneq dikete

pirça wî ya zerqimer û difirî nav çavên mirovî.

Silêman li ser milê xwe yê çepê ra zivirî û li esmani nihêrî. Li aliyê ro-

jhelatê da istêra sibêdê du rîman bilind bibû. Bi wê hindê ra zanî, ko

seûgura sibê ra hindik maye. Lap kete lezê. Êdî giheştibû binê geliyi. Hewa berebere ronahî dibû. Keviyên berfê li pêşîra çîyan da dihatin xûyanê. Li ber barana şeva dî rengê berfê gewir bibû. Berf hişinokî bibû.

Av her alî ji erdê dikişiya û tevî hev dibû û dibû çemekî mezin.

Hurmehurma çemi bû, dinaliya û li nav hev da dişkest û li ser hev ra diqulibî û pêş da li ser milê çepê da ber bi deşteke vekirî diçû. Çem wisan

rabibû û lev ketibû, ko fîlan nedikarî xwe lê bidana.

Xwelî sist bibû. Hindek ciyan lingên Silêmanî ta gîzekan li erdê da diçûne xwarê. Li pêşberî wî deşteke vekirî ber va diçû. Hindî çavên wî

qeter dikir, deşt û dar û bar, gund û avayî bûn. Cara yekê bû, ko  
Silêman

dadikete vê deştê. Her der jê ra nenas û namo bû. Gehîştibû serê  
duriyanekê. Nizanî yê kî alî da here. Demekê li nav hişê xwe da çû.  
Paşê

li ser milê xwe yê rastê da zivirî û dakete deştê.

Ronahiyê cîhan tijî kiribû. Esmen sayî bû. Te digot qey barana şeva  
dî

rûyê esmani şûştiye, ko bînanî perûyekî şîne armûşîn diteyîsî. Wekî  
benefşeyeke tere şîn rewneq diketê.

Yekimîn tirîşka tavê da qafên çiyayên bilind. Pêş da qûçên çiyayê zer  
36 BILÎCAN

kirin. Paşê ew zeratiya weke rûnê avandî nermenerm jor da ber bi  
sîng û

pêşîrên çiyayê, ber bi banî û bêlanan şûlikî. Hê riyeke wisan jî  
neçûbû, ko

tavê li deştê jî da. Deşteke kesk û şîn bû. Her alî çêre, çirvan, keskatî  
û çî-

men bûn. Daran taze dixwestin bişkoj bidin. Li hindek ciyan da, ko  
berf

taze li ser erdê rabibû, gezîze, guleberf û rebenokên sipî weke  
leşkerên

sipîpoş der û deşt dabûne ber xwe. Lê li bajarokê wan da hê taze  
belekî

diketin berojan. Bi vê hindê ra diyar bû, ko riyeke baş hatiye. Vêderê  
êdî

çiya û deşt ji hevdu diqetiyan. Çiya kuta dibûn û deştê dest pê dikir.  
Lê  
deşt deşta qontara çiyên bû. Berkêş bû. Lap li kutaya çiyên da, li  
qontara  
wan da, li bintara rê da li jêr tatekî mezen da kaniyeke gurover  
hildikeliya  
û gerînekek çê dikir. Tatê raserî kaniyê weke sîvankekê kepê xwe li  
ser  
kaniyê da daliqandibû. Silêman li ser wî tatî rûnişt. Hebana xwe ji  
milê  
xwe vekir. Kewanê xwe ji milê xwe derxist û danî binçoka xwe. Derê  
hebanê vekir û nanek ji hebanê deranî. Hindek penîr jî danî ser û  
dest bi  
xwarinê kir. Qafreş jî li kêlekê ketiye. Çavên xwe kutaye nav çavên  
wî.  
Silêmanî bînanî tiştê ko gunehekî mezin kiribe, bi pelepê dest avîte  
hebanê û nanek bi hindek penîr va jê deranî û avîte ber Qafreşî.  
Qafreşî  
torintorin nan kire nîveka herdu lemên xwe û hûrihûrik lê ba ket.  
Silêman jî xerîkî xwarinê bû. Herduyan mirçe mirça devên hevdu  
dibi-  
hîstin.  
Piştî xwarinê Silêman rabû kewanê xwe hema wisan da destê xwe  
û  
dakete biniya tati. Li ber kaniyê xwe deverê dirêj kir û qurûyî avê  
bû. Du  
bêhnan av hilçînî qafê xwe. Gelekî tîhnî bibû. Piştî wê hindê ko têr  
av

wexwar, li ser kaniyê rabû şipê û pê dermilkê xwe devê xwe paqij kir.

Pêşîra kurtikê wî bibû herî. Pê kefa destê xwe ew heriya paqiş kir û pêşîr

û serçokên xwe dakuta. Dîsan bînanî caran derê hebana xwe bi rêk û pêkî

girêda. Heban avîte milê xwe û li ser piştta xwe da ediland û bendê wê li

ser sîngê xwe girêfîtik lêda. Kewanê xwe avîte milê xwe. Doxîn û dor-

laqên xwe qîşt û rêk û pêk kir. Xwe saz kir û dakete serê rê.

Li wê navê da, Qafreşî jî, ko nanê xwe kuta kiribû, dakete ser kaniyê.

Li

rex kaniyê xwe li ser lemên xwe da avît û dest bi çelpandina avê kir.

Têr

av çelpand û paşê bi zimanê xwe dora devê xwe alast û tevziyên xwe rast

kir. Silêmanî gazî kirê û tev li rê ketin.

Çiyan êdî xatirê xwe ji deştê xwestibûn. Lê li binê deştê layê çepê hin-

dek kulot li ber çavan diketin. kulotên vepoşiyayî li tûmên deven û qî-

farên hişkbûyî. Ev kulotana angorî zemîn gir û bilind bûn. Lê layê rastê

hindî çavan qeter dikirin, her deşteke ripe rast bû. Silêman û Qafreş êdî

37

BILÎCAN

vaye daketine nav dilê deştê da.

Ev e çendîn roje ko wa bêy rawestan şev kirine roj û roj kirine şev û rê

pîvane. Gelek deşt û gelî û çiya û newal li pişt serê xwe ra hêlane.

Zor

westiyane û ji weş ketine. Lê li ser xwe va nayînin.

Li nav hizran da bû, ko li binê girekî rastî keriyekî giran hat. Du şivan

li dora keriyê ra dihatin û diçûn. Du, sê seyên wan yê hewikistûr jî

hebûn. Gava ko seyên şivanî çav li wan ketin, hêriş anîne ser wan.

Silêmanî gurzê xwe ji bin kewşê xwe deranî û xwe û Qafreş ji devên seqan

parast. Bi rewterewta seqan ra sereşivani li dajoyî kire gazî:

»Kuro nehêle seqan ew rêvîngê han bilaw kirin!«

Dajoyî bi taw xwe bi seqan ra gîhand û bi zorê Silêman û Qafreş ji de-

vê seqan deranî.

Silêmanî gazî kir:

»Şivano bereket be!«

— Li ser çavan ra hatî, bi xêr û xweşî!

Şivani li ser û sikomê Silêmanî nihêrî. Zanî ko ew ji ciyekî dûr ra hatiye.

Jê pirsî:

»Erê bira pirsiyar bê xewş e, tu ji ko tê û tu dê kû da herî?«

— Ez ji ciyekî dûr tîm.

— Ew ciyê dûr bênav e?

Şivani bi ken jê pirsî.

Lê Silêmanî li ser hemdê xwe û bi mijdahî got:

»Ez ji Zozanan tēm.«

— Tê ta kê derê herî?

— Ta Şengarê.

— Heylo Şengar? Xudê xêr ke!

Silêmanî bi şerm û fedî bersiv da:

»Ez ji xwe ra li rênçberiyê digirim. Li şivantiyê digirim.«

— Ha, ha, navê Eliyê Siwaranî bihîstiye. Dixwaze here ba wan bibe şî-

van, ha ... Mala Eliyê Siwaranî niha li xaniyan da nemane, niha derketine

warkozê.

Dema ko Silêmanî navê Eliyê Siwaranî bihîst, dilê wî lerizî. Jê we reng,

ko ew nava pêş da jî ji devê kesekî dî bihîstiye. Seheke taybetî lê dest da.

Seheke tevî tirs û xweşiyê. Silêmanî li ser hemdê xwe ji şivani pirsî:

»Bira Eliyê Siwaranî kiye?«

Şivani bi girnijîn bersiv da:

»Mala teyê, te çawa navê Eliyê Siwaranî nebihîstiye?! Ew serokê

38 BILÎCAN

hefthezar û heftsed malan e. Hefthezar û heftsed malên kurd û ereb li bin

siya wî da dijîn. Xûlên hêştirên wî, keriyên pezên wî, garanên dewarên wî

revoyên hesp û hêştirên wî der û deşt hilnagirin.«

Silêman û dajoyî bi axiftin xwe bi kerî û sereşivani ra gîhandin.

Sereşivani jî serçavanî da Silêmanî.

Xelendor li ser kuçiki amade bû. Tatik raxistin û li ser tatikan rûniştin  
û xerîkî xwarinê bûn. Qafreş jî li rex wan ket. Şivanan kûtekî garisî  
avîtin

ber wî. Qafreşê birsî kût kire nav herdu lemên xwe û lezelez lê ba  
ket. Piştî

xwarinê Silêman rabû şipê û malavayî ji şivanan kir û hebana nanê  
xwe

ko şivanan jê ra dagirtibûn avîte milê xwe û dakete ser wê rêya ko  
şivanan

nîşanî wî dabûn.

39

BILÎCAN

5

Der û deşt, gelî û newal, dar û ber, gul û giya, çil û çiya, gedûk û  
geboz,

herd û tîşik, zang û zinaran, hemûyê rengê xwe guhestibûn. Rûçikê  
hemû tiştî li ber baranê hatibû şoştinê.

Gul û giya li ber seqema paşî baranê pejmirîbûn. Şextê li wan dabû.  
Hemûyan weke birîndaran serê xwe li ser ustuyê xwe da xwar  
kiribûn.

Erd bibû herî. Heriyeke çivir û zeliqok. Herî bi ling û derlingên  
Silêmanî

va dizeliqî. Silêman li heriyê da mabû. Carcaran herî wisan bi çarixên  
wî

va dizeliqî, ko nedikarî li ber giraniyê piyên xwe bavêje. Îca hînga  
neçar



dibû, ko xwar bibe û ji erdê darikekî, lîpekî, xîçekî hilde û pê binê  
çarixên

xwe paqij bike. Yan jî xwe bi berekî ra, hîtekî ra bigehîne û binê  
çarixên

xwe bide ser wî kevirî û çarixên xwe li ser bisû, da ko ew heriya ko  
bi binê

çarixên wî va zeliqiye, li ser pişta wî kevirî bimîne.

Li ber lêva xwe da got:

»Way lê çol û hol bûyê! Eve jî ji ber hat û bextê min bû, ha! Gereke  
hema li van rojan da, ko ez bûme rêvîng, baran dest pê bike lo!..

Şeva

pêşîn min her der nas dikir. Min xwe bi kûlê ra gîhand û li kolka  
Mîrzo

Kizoyi da êwirîm. Lê şeva dî ezî belengazî nenas, ezê ko da  
biçûyama.

Min ko çi der nedinasî...«

Xwe ji xwe ra diaxift û pêş da diçû.

Şeva dî dîsan bînanî şeva pêşîn baranê dest pê kiribû. Baraneke guj  
û gi-

ran û libgir. Li ber gujatiya baranê we hest dikir ku, libên baranê li  
vêderê

ji libên barana navça wan girtirin. Li dû baranê ra sira paşnixteyê  
dest pê

kiribû. Silêmanî ko çi cî nas nedikir, hema li ber baranê mabû. Vî alî,  
wî

alî çavên xwe gerandibû. Li milê çepê dûr va çavên wî bi  
pilûçeberekî

ketibû. Kevirekî pilûç li nîveka deşta ripe rast da bera wî li ser xwe da  
rakêşabû. Hema li ber barana guj, ber bi wî pilûçekevîrî helatibû.  
Xwe  
avîtibû ber pesêva wî kevirî. Lê pesêva wî kevirî pesêveke vekirî bû.  
Silêmanî çî çare nedîtibû. Hema ta sibêdê geh li ber pesêva wî kevirê  
pilûç li ber ba û baranê mabû, geh jî vî alî wî alî her li ber baranê  
pêgermok gerandibû. Yan jî hema carê rexeke xwe dabû ber pesêva  
keviri.

#### 40 BILÎCAN

Ta ew rexê wî kûşkê hişik bibû, rexê wî yê dî li ber baranê, li avê da  
mabû.

Sira paşî baranê lê kar kiribû. Nanê wî jî mêjive bû, ko kuta bibû.  
Wekî mirov birsî be, tendûra zikê mirovî vala be, sir ta kezeba  
mirovî,

ta mejiyê hestikên mirovî kar dike. Wakî şeva dî Silêman neba û yekî  
dî

ba, bêgotin yê li ber wî kevirê pilûç, li ber serma û birsîna can bida.  
Lê

Silêman xoragir û bi hêz û pêz bû. Ewî gelek şevên weha  
bihorandibû.

Rast e, ko ew li dîwanxana bav û kalê xwe da mezin bibû. Piştî  
mirina

kalkê wî û kuştina bavê wî û dayîna talanan û belawbûna dîwanxana  
bavê

wî jî, ew li dîwanxana Emer axayê bûrayê Mamê Îsi da dima. Lê  
gelek

caran wekî vê carê, dîwan û dîwanxane cî da hêlabû û di gel heval  
û hogi-  
ran tîr û kewan, şûr û rim û xencer tev girêdabû û çûbûn nêçîra  
pezkûviyan û şeveder mabûn.  
Lê şeva dî şeveke cuda ji hemû şevan bû. Sir û sermaya şeva dî  
seqem û  
zemherîra danê zivistanê ya zozan û bêlanên bilind dihanî bîra  
mirovî.  
Seranserî şevê li ber wê seqemê, li ber wî bayî û wê baranê mabû.  
Ew jî bi  
zikê vala. Lê Sileman xortekî kirarî bû. Ewî hema wisan destgirêdayî  
xwe  
nesipartibû seqem û ba û baranê. Hema li ber baranê pêgermok  
lêdabû.  
Paşê, qasekê revîbû û dijî sir û sermayê têkoşîbû. Şev gava ko sir û  
seqemê  
dest pê kiribû, û Silêmanî xwe li wê besta bê dê û bê bav da tenê  
dîtîbû,  
serhatiya kurê Harisi ketibû bîrê. Serhatiya kurê Harisi gelek caran  
ji de-  
vê ridênsipî û çîrokbêjên dîwanxanê bihîstibû, ko digotin:  
»Kurê Harisi şeveka çilê zivistanê şeveder dimîne û ba û bager jî  
dest pê  
dike. Ew penahê dibe ber kûleyekê. Lê hundurê kûlê hê ji derva jî  
sartir  
bûye. kurê Harisi li nava kûlê da keviyekê dide pişta xwe û ta sibêdê  
ewî

kevirî wekî barekî li ser pişta xwe digerîne. Daku leşê wî li bin barê girane

keviri da germ bibe. Bi vî cureyî kurê Harisi dijî sir û sermayê li ber xwe

dide, da ko sibêdê ra ewî li hundurê kûlê da peyda dikin û dibin malê...«

Ca çîrokbêjan çend pelg û çiqên ciwan jî li serhatiya kurê Harisi zêde dikirin. Ewan digotin:

»Gava ko şopgerîn kurê Harisi peyda dikin û dihînin mala wî, dayîk û

bab û jin û xizm û kes û karên wî hemû lê berev dibin û dibêjinê em şe-

va dî bona te ranezane. Em he li seranserî şevê da li derva mane. kurê

Harisi ji wan dipirse: Başê hûn bona min ranezane, bêjin kanê şeva dî ta

sibêdê esman çend caran bû ewrayî û dîsan bû sayî? Her yek tiştekedibê-

je. Lê maliya wî dibêjê: Şeva dî esmani heft caran rengê xwe guhost. Heft

caran bû ewrayî û dîsan vekir. Hînga kurê Harisi dibêje: Maliya şîrhelal

û emekdar ji day û baban çêtir e. Diyar e tenê maliya min li xema min da

41

BILÎCAN

bûye û ji bona min xew li çavên wê neketiye. Rast e şeva dî ta sibêdê  
es-

man heft caran bû ewrayî û heft caran bû sayî...«

Silêmanî jî ji wê serhatiya kurê Harisi wêcê verdigre û ta sibêdê  
pêgermokaan digerîne. Lê ya rastî şeva dî kê li dewsa Silêmanî da ba,  
yê

hema li ber pesêva wî berdepilûçî can bida. Canê wî yê li ber sir û  
ser-

mayê, li ber seqema paşnixtê ji kalanê bedena wî bikişiya. Leşê wî  
yê sikî

sar, yê li ber wî kevirî bima. Ca pêş da qirikan dê çavên wî  
derxistana.

Paşê firindên berateyan, yê wêkî sîsaark û dalaşan dê li ser leşê wî  
da

peya bibana û leşê wî piroze bikirana û yê kelkelê wî yê vala li bestê  
bi-

hîştana. Yan jî gurgekî bîrsî dê rastî leşê wî bihata û yê zikekî têr ji  
goştê

mirovan bixwara. Lê Silêman ta sibêdê li ber xwe dabû.

Li her aliyê deştê da gundên bi dar û bar û ava û giran mil kutabûn  
hev.

Lê Silêmanî hindî ji desti dihat, xwe ji gund û avayiyan dûr dikişand.  
We

dihizirî, ko li van gundana da jî hemû wî ya dinasin.

A, Silêman gelek şevên wiha li derva mabû. Hemîn heftiyê carekê jî  
li

meydana guleşanê ya bajaroki da, di gel heval û hogiran, di gel  
hevta û

hevsal û hevtemenên xwe û heylo gelek caran di gel mêrên qert û navsalî

jî cirîdanê, zoranê û milmilanê fikir. Ca ew li van kûreyên têkoşînê da pi-

jiyabû, bibû pola. Vêca gereke wî dîwanxana ko tê da çî dilxoşiya wî tunebû, cî da bihêla û biçûya. Her rastî jî, qawegerandin jê ra şerm bû.

Ew jî qawegerandin li dîwanxana kesekî da, ko sîxurê dewleta dagîrker

bû û bi destê dewletê li ciyê kal û bavê wî da rûniştibû. Ew qawegerand-

ina jê ra neng bû, neng. Qawegerandin ji kesekî ra ko ta bavê wî zindî bû,

ji ber kar û kiriyarên xwe yê nerê û şermîn, rûyê wî nedigirt, biçûya dîwanxanê jî. Her rêya dîwanxanê jî nedidane wî. Gava ko xeber bihata

ser xeberê, xelkê digotin: Gurg ji dest kiriyarên xwe nare avayan.

Ca qawegerandin li dîwanxana wî da, gelekî li zora Silêmanî dihat. Ew

kesê ko piştî bavê wî, bi destê zorê û pîlanên neyaran li ciyê bavê wî da

bibû mîr. Ew kesê ko piştî talanbûna dar û nedarên mala wan, piştî wê

hindê ko mala wan ketibû tengî û taliya tunebûn û nedariyê da, êl ji ser

wan bir kiribû û bibû axayê navçê. Niha gerek bû Silêman li dîwanxana

wî da qawe bigeranda...

Silêmanî rê dipîva û ev hizrên aloz û tevî hev li nav serê wî da lev digeriyan.

Apê wî Îsê Mîrî bi tundî ketibû jêr desthelatdariya mîrê tazepêketî da.

Wî ji tirsê jina xwe Xecîcê da, nediwêrî bigota, ko ez feleme yan êzdî, bisulmanim yan zerdoştî. Wî mêj va gema xwe dabû destê Xecîcê.

Xecîcê

42 BILÎCAN

ew kî alî da bada, ew wî alî da diçû. Ca ewî qet li himber mîrê tazerabûyî

da nedikarî xwe eşkere bikira.

Erê, gema wî li destê jina wî da bû. Jinkê bigotayê bimire, bimire.

Bimîne, bimîne. Eva bû ko Îsê nediwêrî dijî mîrê ko niha bûye mîratxorê

mîratiya bav û birayê wî, deng bikira.

Xelkê li bara desthelatdariya Xecîcê li ser Îsêyi da û fermanberiya Îsêyi

ji Xecîcê ev gotina pêşînan digotin:

Sê tişt hene li rû dinê. Hersêk jî li hesabê mirinê. Mişkê li terazinê, berxa li ber bizinê, mêrê li xebera jinê.

Lê gava ko yekî dilşewitî xeberek li vê barê da li ber Îsê ra davît, Îsê dig-

ot, ma xewşa xwe çiyê!? Silêman pêxember jî bi gotina Bilqîsê dikir.

Ma

xwe çî dibe, jin û mêr herdu jî mirovîn, herdu jî kerê leşkê ne.

Lê Silêmanî nedikarî ew hinda bipejiranda. Ewî dixwest here mîrê

tazepêketî li ser texti bavêje û bixwe mîratiya kal û bavan bigre destê xwe.

Xwe ji xwe ra li nav hişê xwe da diçû û digot:

»Erê eger ev şindoyê ko niha bûye mîr, hêjayî wê hindê ba, li zora min

nedihat. Eger li xizmeta gel û welati da ba, eger ji me jêhatîtir û têge-

hîştîtir û şarezatir ba, dîsan jî li zora min nedihat. Lê ev şindoyê ko niha

bûye mîr, ji bilî hêktûmariya neyar û dagîrkeran tişteke dî nizanê. Tu

dibêjî qey ew hema ji bo xoşxanî û hêktûmariya dujminan hatiye afi-

randinê...«

Lê yê çî ji Îsê apê xwe bikira. Ne dikarî hema wisan li nava hezaran dost

û dujminî da dijî apê xwe rabûya, ne jî dikarî li himber kir û kiriyarên wî

da bêdeng bima. Eva bû, ko çî rê û çare nedîtibû û ketibû serê rê û dirban.

Rast bû ko gotibû ezê herim Şengarê. Lê bixwe jî nedizanî Şengar li kû

ye. Pê wa bû ko Şengar dûrtirîn cîhê cîhanê ye.

Li nava van bîr û hizrana da bû, ko rastî geliyekî kûr hat. Herdu layên geliyi bi kevirên reşe arsofik û dar û barên sêrek hatibûn vepoşandinê. Li

serberjêrekî tund û lêj da berjêr bû û dakete binê geliyi. Qafreşi jî hema



wisan dabû dû wî. Lê Qafreş ew Qafreşê caran nibû. Lawaz bibû.  
Daketibû. Weriya bû. Pirça leşê wî li ber ba û baranê, li nava qur û  
gema re  
da rengê xwe derdabû. Ew rewneq û teyîsîna pêşîn lê nemabû.  
Pirça leşê  
wî rengê pîneyekî ko li ber tav û ba û baranê bimîne û reng guhestî  
bibe,  
dida. Her çend ko westiyayî û bîrsî bû jî, lê dîsan dûlka xwe dabû ser  
milên xwe. Lê ne wekî pêş da bû. Dûlka wî hindekî sist bibû. Hindekî  
daketibû li ser kulîmekan. Gava çavên Silêmanî pê ket, dilê wî pê  
şewitî.  
Ewan tev li ser kendalekî kûr ra, ko hurmehurma avê bû, tê ra  
derbas

43

BILÎCAN

dibû, banz dan. Av wisan bi guj diçû û deng vedida, ko li ber  
hurmicîna  
avê, guçkên mirovî ker dibû. Herdu layên kendali kevirên reşe  
arsotik  
bûn. Te digot qey hostayekî kirarî ew kevirên herdu layên çemi bi  
dest  
biriye û rê ji avê ra vekiriye. Avê dilê erdê dirandibû û kevirên herdu  
layên  
kendali birîbû, û bi hurmehurm tê ra derbas dibû. Avê wisan kendal  
teng  
birîbû, gava ko mirov kûşkê ji kendali dûr diket, avê û kendali bi  
mîrovî

va diyar nedikirin. Besta dora wê avê pêda li kevirên reşe arsofik  
hatibû  
vepoşandinê. Hindik kevir wisan tûj û birek bûn, ko gava piyên  
Silêmanî  
dikete ser, hindik dima weke kêrikê çarixên Silêmanî bibirin.  
Berê wan kete ser nizarekî, ko taze berf li ser rabibû. Li pêşîra nizari  
da,  
pûş û pelaş lev aliyabûn. Pûş û pelaşên sala çûyî li ber berfê û sir û  
serma  
û germayê gewir bibûn. Çêreya taze jî ji bin wan pûşana ra dabû  
derê û  
rengê gewir û kesk tevî hev bibûn û renekî taybetî afirandibûn, ko  
kewî  
va dihingaft. Darên evrisi jî tektekî û dûrî hev li pêşîra nizari û li rex  
ke-  
virên ko her yek wekî kêlikekê bilind û şûş rawestabûn, dihatin  
xûyanê.  
Kêlekevîran û darên xuriste pêkva dîmeneke sosret afirandibûn û  
dûr va  
weke siwareleşkerekî, ko amadeyî hêrişê bibe, bera mirovî li ser  
xwe da  
radikêşan.  
Qafreş li dora kendali ra ketibû çerxê û bîn digerand. Disimsimî û  
erd  
pêkol dikir. Li ser kolekî da mîst. Li dû ra bi bêhinvekêşk ber bi nizari  
simsimî. Paşê guçkên xwe mûç kir û çûr ma li pêşîra nizari nihêrî.  
Silêman li ser xo û xideyên wî ketibû. Dizanî ewî tişteke dîtiye. Bêhna

nêçîrekê kiriye. Lê kire mûçîn. Qafreş miricî. Silêman lap dilniya bû,  
ko  
Qafreşi nêçîrek dîtiye. Çû li pişt wî rawesta. Li dîtingeha wî nihêrî.  
Baş  
dîna xwe dayê. Çi tişt nedît. Dîsan çavên xwe kuskusand. Destê xwe  
ji  
çavên xwe ra kire sîvank. Bizerê karî li nav dar û beran da tiştêkê  
bibîne,  
ko hemmanê dilivî. Hêdîka hilkişiya ser soteberekî. Gava ko baş dîna  
xwe dayê, dît ko çend pezkûvî waye li nav dar û berên pêşîra nizari,  
li nav  
wan pûş û pelaşana da diçêrin. Berê pezkûviyan ketibû ber bi  
hevrazi û  
hêdî hêdî dixwestin, ko li ser hingivokê bikevin. Silêman bi hemmet  
li ser  
keviri peya bû. Kewanê xwe ji milê xwe şiqitand. Pala xwe da  
kevirekî.  
Tîrek ji tîrdanka xwe deranî. Çoka xwe ya çepê ji milê xwe yê çepê  
ra kire  
palgeh û tîra xwe danî ser jehê kewanê û nîşange girt. Li wê navê  
da  
pezkûvî jî çêreçêre ber bi hêsûyê hildikişyan. Silêmanî li nav bira  
pezkûviyan da kavirekî sorî qelew, nîşan kir û tîra xwe bi gişt hêz û  
karî-  
na xwe va ber bi sîngê kaviri berda. Di gel tîra wî, bû fîtîna pêşengi  
û kalîn  
jî bi bira pezkûviyan ket û di çavgirtinekê da, pez li hêsûyê da  
qulibîn. Bi

## 44 BILÎCAN

havîtina tîrê ra Silêmanî nav bi Qafreşi da û Qafreş jî hema li dû tîra Silêmanî ra, da peyê pezkûviyan. Lê ta Silêman û Qafreş gihîştin pêsîra

nizari, ji hindek xûnê pêve çî tişt nedîditin. Xûneke gevez, bînanî qey-

taneke sore gircîgircî rijiyabû ser pûş û pelaşan. Silêmanî da dû rêça xûnê.

Rêça xûnê ra girt û bi lez li ser milê ket. Hema bêhnekê da li ser milê ket.

Hindik mabû, ko bêhna wî biçikiya. Gava ko li ser milê ket, rêç wenda

kir. Hindî çavên xwe gerand û negerand, çî şûnewarek ji xûnê nedît.

Gazî

Qafreşi kir. Qafreş simsimî û bêhin kişand û bi rewterewt ber bi layê rastê, layê beroji zivirî. Silêman jî da dû wî. Aliyê rastê çiya hindav da

hilkişiyabûn. Du, sê zinarên bilind wekî zêrevanan dest dabûne destên

hev û li ser hêsûyê zincîrqol girtibûn. Qafreş bi rewterewt ber bi wan zi-

naran revî. Silêman jî bi helkehelk xwe bi Qafreşi ra gîhand. Qafreşi xwe

dabû binê zinarekî bilind û direyî. Durust li binê zinarî da kaniyek hildikeliya. Destek av ji ber kaniyê dikişiya. Av bi hurşehurş li nav kevir

û kuçikan ra derbas dibû û bi taw û guj ber bi jêr diherikî. Silêmanî  
çavên  
xwe kuta pêşîra zinarî. Dît ko du pezkûvî waye li pêşîra zinarî da  
serên  
xwe dane ber hev û zil mane li wan dinihêrin. Silêman dîsan  
qerefîska  
rûnişt û ew tîra ko hema wisan li desti da bû, danî ser jehê kewanê  
û nîşan  
girt û hindî hêza wî hebû, jehê kewanê li ser xwe da kişand û tîr  
durust  
ber bi wan herdu pezkûviyana berda. Tîra wî li zinarî ket û bû xuşîna  
hin-  
dek hûreberdan û li ser wî da jorda rijiyân. Bi havîtina tîrê ra  
kûviyekê ji  
wan herdu kûviyan li ser wî zinarî, banz da ser zinarê dî û li ber  
çavan  
bezir bû.. Lê kûviyê mayî kire kalekal û nikarî li ser wî zinarî banz da  
aliyê  
dinê. Hema wekî gêjan bi kalekal li dora xwe lev dizivirî. Zinar pir  
bilind  
bû. Silêman bona wê hindê ko hilkişe pêşîra zinarî, debiya, ko li pişta  
wî  
ra biziviriya. Her çend ko pir westiyabû, lê dîsan jî bi taw ji cî rabû û  
bi  
helkehelk ber bi pişta zinarî hilkişiya. Li rêyeke weke pêlekanan ra li  
ser  
zinarî ket û dakete pêşîra zinarî aliyê beroji û xwe bi kaviri ra gîhand

kaviri rêya revê nedît. Silêmanî destê xwe li hiriya ser pişta wî da şe kir.

Bû kalekala kaviri. Silêman bi piyên wî ra girt û ew li erdê da û piyekî xwe

danî ser uskura wî û destê xwe bire ber pişta xwe û xencera xwe ya tetikzîv

ji kalani deranî. Li wê demê da Silêmanî dîna xwe dayê, ko tîra wî hê jî

waye li nîveka parestû yên kaviri da maye. Tîr ta nîvekê li parxanê kaviri

yê fêza valaya newqa wî da çik bibû û serê tîrê layê dî ra hilavîtibû. Silêmanî dest avîtê û ew ji cendeki kişande derê. Bû kalekala kaviri. Dewsa tîrê jêk tîş bû. Xûneke reş jê kişiya. Silêmanî bêy gîrobûn destê

xwe avîte serê kavirê birîndar û xencer li hewka wî helsût. Bû fîşqîna xûnê

45

BILÎCAN

û peşkiya pêsîra zinarî; kaviri dest û piyên xwe lev dan, pêş da bi lez lingên

xwe li keviran disût. Lê paşê berebere sist bû. Berebere ew çirçirandina bû

lerzeke sivik. Hêdî hêdî ew lerizîna jî kêmbû. Silêmanî hêdîka serê kaviri

li ser piştê da tewand û xencer li îlika wî da. Îlka wî jenî. Gava ko xencer

gihîştê îlika kaviri, kaviri xwe çirçirand. Lingên xwe li keviran sût.

Silêmanî xwe li ser da avît. Lê kaviri dîsan jî xwe çirçirand. Hindik mabû,  
ko Silêman li ser seri li zinarî da jor da bihata. Bi lez kavir berda û xwe paş  
da kişand. Xûn hê jî li uskura kaviri ya jêkirî dikişiya. kaviri hê jî dest  
û  
piyên xwe lev disût. Silêman li pişt cendekê kaviri kundkî rûnişt û bêhna  
xwe berda û li candana kaviri nihêrî. Herçend ko kavir lap sar bibû jî, lê  
hê jî rehên uskura wî davîtin. Xûn hêdî û hindik ji wan rehana ra dikişyan.  
Gava ko Silêmanî dît, êdî can li cendekê kaviri da nemaye, xwest ko ewî  
li ber xwe va bike û bibe ser kaniyê, lê cendekê kaviri gir û giran bû. Silêmanî nikarî ew li ber xwe va bikira û bibira binê zinarî. Bi neçarî hêdî-  
ka ew li zinarî da daliqand û bi hemmet jor da berda binê zinarî. Cendek  
bi du, sê teqlan girêlî binê zinarî bû. Silêman li rêka ko tê ra hatibû, li pişt  
zinarî ra zivirî û hate ser cendekê kaviri ra rawesta. Destên wî ta gîzekê  
bibûn xûn. Xencera wî jî hema wisan li desti da bû. Tavê li xencera xû-  
navî dida û xencerê sorîva dibiriqand.  
Qafreş jî çû pêşîra zinarî û ew xûna rijiyayî bi dil û can alast. Paşê dûl-

ka xwe da ser milên xwe û durust li wî cîhê ko Silêman tê ra peya  
bibû,

jor da hate bal Silêmanî.

Silêmanî devê xencera xwe pê hiriya sîngê kaviri paqij kir. Milên xwe  
ta

anîşkan veda. Dest avîte cendekê kaviri, ew ber bi avê kişand.

Silêmanî serê kaviri ji cendeki cuda kir. Paşê uskura kaviri da ber ava  
kaniyê û pak şoşt. Xûna kaviri têkelî ava kaniyê bû û berjêr ber bi  
binê

newalê şûlikî. Li dû ra cendekê kaviri kûşkê ji kaniyê dûr xist û nikilê  
xencera xwe li sîngê kaviri ra kir û postê wî qelaşt. Postê kaviri çir  
bû.

Bi zorê dihate guranê. Lê Silêmanê kirarî xencer li nîveka goşt û  
posti

da çik kir û ew ta ser gunikan qelaşt. Piştî hînga bi serên tiliyên xwe  
post

dest kir. Ta kavir kevil kir, li xûyê da vema. Bi her cureyî bû, kavir bi  
ser û ber û rêk û pêk gura. Nehîşt pirtiya nujguroyi li ser posti da  
here.

Piştî wê hindê ko cendek lap ji kevilî cuda kir, kevil li bin cendeki da  
rast kir û pê nikilê xencera xwe zikê kaviri dirand. Bû fişîna hûrê  
kaviri

avîte derva. Silêmanî bi hemmet dil û hinav û hûr û pizûrên kaviri ji  
nav zikê wî kişande derê. Wisan bi hemmet kişand, nehêla pirtiya  
kirs

46 BILÎCAN

û kewalê birije ser cendeki.



Qafreş jî li pêşberî wî li ser herdu leman ketibû. Çûr mabû li destên  
wî  
dinihêrî. Gava ko Silêmanî hûr û pizûr li nav zikê kaviri deranî,  
Qafreşi  
dora devê xwe alast û hêdîka kire kûstîn.  
Silêmanî gotê:  
»Bihêle, ezê niha para te jî bideme te.«  
Îca paşê pê xencera xwe dil, herdu gurçik, cerg, pişik, patireşk, hûr  
û  
hindek jî ji rûdiya zirav ji yêr dî veqetand û danî layekî. Her çî yê  
mayî jî  
hema wisan bi gild û gemarê va avîte ber Qafreşi û gotê:  
»Hanê eva ji te ra pêşxord, ca tu hê ava devê xwe birijîne, emê paşê  
jî te  
çav ra bikin.«  
Qafreşi qîlên xwe li doran û pizûran da çik kir û ew wê da rakêşa.  
Silêmanî jî hêdîka piştî xencera xwe pê hindek pûş û pelaşan paqij  
kir. Pê  
xencerê zirav ji ser kezebê hılanî û wê da avît. Hûr hilda û çend  
gavan wê-  
datir çû biniya avê. Pêş da bi destên xwe ew gild û gemar û ka û  
kuliyan  
ko diqewimî bi hûriki va zeliqîbin, paqij kir. Paşê devê hûriki hindekî  
fire  
kir û bi hemmet hûrik vacî kir û rêxa di hundirê hûriki da royî nav  
avê  
kir. Bêhna rêxa taze û çil û çirpî û gîhayên negewirandî, belawî hewa  
bû.

Avê lê da ew rêx û gild û gemara hemû di gel xwe berjêr bir.  
Silêmanî hûr vergerande derva. Wisan hêdî û hemmet vergerand,  
ne-

hîşt ko pirtiya rêxê bikeve nava hûriki. Li dû ra hûrik temîz şoşt û  
hanî,

danî rex xwe û got:

»Min paşê kar bi te heye.«

Silêman ji dil û can keyfxoş bû. Bi fîtefît hat û li ser cendekê kûvî, yê  
gurayî ra rawesta. Kelîgoşt e. Mêjve ye, hindî ko ji malê derketiye,  
ne tenê

dev li goştî nedaye, belkû xwerekî germ jî dest nexistiye. Cendekê  
gurayî

hema wisan li ber hewayê mabû. Silêmanî li dor û berên xwe nihêrî.  
Gwînî û êzing û qirş û qalan her der dabûne ber xwe. Bi lez dest bi  
brevkirina qirşîk û êzingan kir. Bi brevkirina qirş û qalan ra li ber  
lêva

xwe da istirana Erezî jî digot:

Ha bi vî Erezî lo hurş e hay hurş e

Ha bi vî xopanî lo hurş e hay hurş e

Gel xwe wê tîne lo qalan û qirş e

Memkê tolê lo sêvkoka tirş e

Ha bi vî Erezî lo nale hay nal e

Ha bi vî xopanî lo nale hay nal e

47

BILÎCAN

Gel xwe wê tîne lo qirşan û qal e

Memkê kiçkokê lo sêvkoka tal e

Ha bi vî Erezî lo hurme hay hurm e  
Ha bi vî xopanî lo hurme hay hurm e  
Gel xwe wê tîne lo qalan û qurm e.  
Bermilek mezin ji qal û qurm û qirşikan berev kir. Qal û qurm li rex  
cen-  
deki bi ser û ber li ser hevdu da hilcinî. Agirek hil kir. Li nava êzingan  
da  
çend şivikên zirav, ko li ber berf û baran û tavê qalçik avîtibûn, pê  
xencera  
xwe baş verot. Her çî qalçik û reşatiya ko bi wan va mabû, renî. Ew  
bi ser  
û ber hilû kirin. Paşê serên wan weke serên şîşikên kebaban tûj kir.  
Çû li  
ber ava kaniyê selekî biçûk li nav selan da bijart û temîz şoşt û hanî  
danî  
rex cendeki. Li rex cendeki rûnişt û pêş da kezeb û pişik danî ser wî  
tatî û  
pê xencerê baş vexist û pirtî pirtî kir. Li dû ra ew pirtikana yekoyeko  
li  
şivikan xist. Pêş da şîşikên kezebê danî ser agirê kozîgirtî. Xûnaveyek  
reş  
ji kezebê dilopî ser agirê kozîgirtî kir û dûkelek çivir ji koziyê quloz  
bû.  
Silêmanî kolozê xwe da destê xwe û hêdîka bi kolozê xwe bayî agiri  
kir.  
Agir geş bû û çizeviz bi kezebê ket. Li demekê da xûna wê mirçiqî.  
Kiz li  
ser ket û berebere sor bûn.

Silêmanî hebana xwe li erdê raxist û şîşkên kezeba sorbûyî li ser agiri  
rakir û serên wan yek alî danî ser hebanê û pê paniya destê xwe kezeba  
sorbûyî şiqitande ser hebanê. Bêhneke xweş ji patîlokan rabû. Bi gef û  
gur patîlok kişande ber arû û piriyan xwe. Li demeke kurt da ewan he  
wisan germegerm hulpuf kir. Piştî hepişandina patîlokan rabû û çend  
êzingên dî jî danî ser agiri û agir gur kir. Vêca şîşkên pişikê danî ser koziyê.  
Li ber guriyan koziyê av û kef li ser pişikê ket û berebere awa wê jî  
mirçiqî û hêdêhêdî rû girt û hişk bû. Dema ko pişik lap hişk bû, ew li ser  
koziyê rakir û dîsan wekî pêş da pê paniya destê xwe ew jî şiqitande ser  
hebanê û ew jî hepişand. Vêca dilik û herdu gurçik baş û bi ser û ber vex-  
ist û li şîşikan xist û danî ser koziya agiri. Patireşk jî hema nevestî danî  
ser berekî û ber rakir û danî rex agiri. Herdu hêlikên kaviri jî vexist û  
danî rex patireşkê. Vêca dilik û gurçik vî alî, wî alî li ser agiri da vergerand.  
Pêş da avek tevî xûnê jê kişiya. Li dû ra don li ser ket. Don li ser koziyê da  
dinuqutî û dûkeleke çivir ji koziyê radibû. Li qasekê da di-

lik û gurçik jî baş sor bûn. Silêmanî ew jî bînanî cara pêşîn pê paniya destê xwe şiqitande ser hebanê û kişande ber didanên xwe.

Silêmanî nîvê

dilkê xwaribû, taze pê hesiya, ko goşt keliye. Yê li wî çiyayî da xoyê ji kê

48 BILÎCAN

derê bihaniya. Xwe ji xwe ra got:

»Goştê peza kûvî hema şît e. Xwyê heba jî, hema yê dîsan şît ba.«

Li wê navê da Qafreş zivirî ba wî. Limbozê Qafreşi li xûnê û gemarê da

mabû. Silêmanî nîvê dilkê ew layê reh û pehan ko wisan baş nepijiyabû,

avîte ber Qafreşi. Qafreşi dilka nîvpijiyayî hepişand. Li dû ra Silêmanî

patireşk jî ko li ber agiri hişk bibû, nîvê wê xwar û nîvê dî jî avîte ber Qafreşi û pê pişta destê xwe devê xwe paqij kir. Herdu hêlik jî hê li ser ke-

viri, li rex agiri mabûn û rengê wan qîmer bibûn. Silêmanî ewan jî li ser

beri hilanî û danî ser hebanê û vî alî wî alî li ber hewayê xist, ta ko zû sar

bibin. Dema ko hulmegulma wan kûşkê kêmbû, ewan jî hepişand û pêstik û reh û pehên wan jî avîte ber Qafreşi. Li dû ra rabû ber bi cendekê

kaviri, ko hema wisan li ber hewayê servekirî mabû, çû. Tava buharê li

goşti dabû û mirovî hemmanê dizanî, ko rûyê cendeki tişteke qerçimiye.

Silêmanî devê xencera xwe li kefa destê xwe sût. Te digot qey dixwaze

pê kefa destê xwe xencera xwe tûj bike. Hema wisan ko xencer li desti da

bû, bû fîtefîta wî û li ber cendeki rûnişt. Kevil li jêr cendeki da baş vekir.

Cendek bi xencerê tîştîştî kir. Hestiyên kaviri gir û bitew bûn. Pê xencerê

nedihatîni îşkandinê. Silêmanî cendek hema li gehikan da hûr kir. bere-

bere goştê gehkirî li ser kevilê kaviri bû qûç. Piştî geh gehî kirina cende-

ki, rabû hûrik hanî û li ber kevilê kaviri danî. Ew goştê gehkirî, yek bi yek

li hûriki da cî kir. Pêş da bawer nedikir, ko ew gošta hemûyê di hûrkê kaviri da cî bibe. Lê hûrik bînanî lastîkê vedikişiya. Ji ser û pêpik û çend

hestikên rûte pîl û parestûyan pêve, ko Silêmanî bi xencerê goştê wan jê

simitandibû, tewawî cendeki li hûriki da cî bû. Silêmanî ew rûdiya zirav

ko pêş da şoştibû û li ber dest hêlabû, ser xwe da kişand û rûdî weke kindirekî li dora devê hûriki aland û devê hûriki pê wê rûdiyê baş û bi ser

û ber girêda û bi darikekî li jîkê da. Wisan li jîkê da, ko bêhin li be ra

dernediket. Devê hûriki te digot qey hate piçêt kirinê. Hûrikê goşti  
danî

ser xîzê û kevilê kaviri lê wer kir. Rabû çend kevir jî vî alî, wî alî danî  
ser

kojên kevilî. Paşê teviziyên xwe rast kir û li rex kevilî xwe li ser taqa  
piştê

velezand. Danê nîvro bû. Tava buharî zeliqandibûyê. Tav kete çavên  
wî.

Destên xwe da ber çavên xwe. Hema wisan li ser piştê  
tiştekekexurmaş bû.

Paşê bi qîjîna sîsark û qertelan ra çavên xwe vekir. Çend sîsark û  
qertelên

gir û gevde li raserî serê wî ger lêdidan. Qertel û sîsarkan bêhna  
goşti

kiribûn. Xwe ji xwe ra got:

»Hema rast e, ko dibêjin baldarên beratê li bin pîlên xwe dinihêrin  
û

dizanin, ka li kêderê cendek heye. Evan çawa zanîn ko vê gavê li vê  
derê

49

BILÎCAN

cendek ketiye? Evan çawa bêhna goşt û xûnê dibêhnin lo!?»

Bawûşkek hatê. Teviziyên xwe rast kir. Bû qirpeqirpa parestûyên  
wî. Li

erdê rabû. Li dewir û berên xwe mêze kir. Her alî tijî dar û êzing û  
qirş û

qal bû. Dest pê kir êzing berev kir. Bermil bermil êzing li rex kevilê kaviri

da komî ser hev kir. Bi berevkirina qurmikan ra istirana Qurmilo ket bîrê. Li ber lêva xwe da mizmizand:

Qurmil qurmilo darmilo

Darmil qurmilo qurmilo

Qurmil qurmikê van daran

Qurmil êzingê wan yaran

Qurmil qurmilo qurmilo

Darmil qurmilo qurmilo

Qurmil qurmikê kezvanan

Qurmil qurmilo qurmilo

Qurmil êzingê şivanan

Qurmil qurmilo qurmilo

Qurmil qurmikê wan gîzan

Qurmil qurmilo qurmilo

Darmil darmilê payîzan

Qurmil êzingê wan qîzan...

Li berojê himber, gwînî qolqolî bibûn. Gwînîzere, gwînîreşe, gwînîhes-

pe û gwînîpişikên ko her yek wekî cendekê pezekî bûn. Silêmanî xwe

gîhande beroji û li her celebê gwîniyan du, sêkek pê xencera xwe li binî

da birî. Paşê gwînî danî ser hev û weke kişrê li dû xwe ra kirkaş kir û hanî

li rex goştî weke gizreyekê li ser hevdu da hilcinî. Bêhna xwe veda.

Li dû



ra, li rex gwîniyan pê pozka xencera xwe korikek veda. Erd xîzêlan bû. Bi

sanahî dihate kolanê. Korikek bi beratî û kûratiya sê, çar bihostan kola.

Li nav tatên li rex zinarî da tatekî tenik angorî binê korikê bijart. Tat li

binê korikê da ediland. Hûrikê goştî li bin kevili deranî û danî ser tatê li

binê korikê da. Wisan danî, ko nîvê hûriki li erdê da û nîvê dî jî li derva

mabû. Li dû ra ew xîza ko li korikê deranîbû, rijande dora hûriki. Tatekî

biçûk jî danî ser devê hûriki û kevirek jî danî ser wî tati û dîsan ew xîza ko

ji korikê deranîbû, li dora hûriki berev kir û xîz li ser hûriki kire qûç.

Wisan bi ser û ber xîz li dora hûriki berev kir, ko çi ciyê hûriki vekirî ne-

ma. Vêca pêş da gwînîreşeyek danî li ser devê hûriki yê bi xîzê vepoşandî

50 BILÎCAN

û li dû ra qirş û qal û qurm û êzing li ser wî gwîniyî da hilcinî û agirek hil

kir. Li qasekê da alavan gwînîreşe nav hev da girtin û ber bi hewa bilind

bûn. Silêmanî kelên ji dest xwe neda û berebere êzing li agiri zêde kir û

wekî gizreyekê ardû li ser agiri hilcinî. Qîrçeçîrç bi ardûyan ketibû.  
Agir

li hev siwar dibûn û guriyên wî du, sê rîman bilind dibûn. Gava ko  
agir

baş gur bû, Silêman du, sê gezan dûrî agiri rawesta û xerîkî temaşa  
lezy û

dîlana alavan bû. Bi bilindbûna guriyên agiri ra Silêmanî li ber lêva  
xwe

da got:

»Ev jî agirê Newrozê. Ev jî agirê pîroz.«

Bi vê gotinê ra Sersal û Newroz û gurikên Sersalkê hatin bîra wî.  
Hemû

salê bi gihîştina Newrozê ra, tevî giştî genc û law û ahil û cahilên  
gundi li

qûça pêşberî malan agirê Newrozê hil dikir. Lê îsal li roja Newrozê  
da jî

li mal da nemabû. Dizîva bi berhana nêçîrê ji mal derketibû. Ewî  
nexwestibû li wê roja pîroz da çavên wî bi şermezarî li nav çavên  
kes û

karên wî bikeve. Heylo piştî veşeriyên jî qet li wê barê da çî tişt ji  
kesî

nepirsîbû. Xwe ji xwe ra got:

»Gelo îsal jî agirê Newrozê wekî her sal hil kirin?«

Paşê bixwe bersiva xwe da:

»Bêguman! Agirê Newrozê nîşana me ya netewî ye. Bêgotin niha  
agir

wekî her sal hil kirine. Kurd bêy Newroz û bêy agirê Newrozê neşên  
bi-

jîn.«

Îca paşê dîlan û govenda genc û law û qîz û bûkan, ya li dora agirê  
Newrozê û geriyana gencên çav li xwe li ser banan û rijandina avê li  
ser  
kulekan, şayî û keyfxoşiya gel û komelê li wê roja pîroz da anî bîra  
xwe.

Dilê wî şewitî. Lê guregura guriyan û qirçeqirça êzingan bala wî li  
ser xwe

da rakişandin. Li alavan mêze kir. Alav li hevdu siwar dibûn û lev  
dialiyên

û ber bi hewa quloz dibûn û dîsan li ser erdê da ditewiyan.

Tava derbuharê berebere ber bi rojava dişûlikî, ko agirê li ser hûriki  
ji

gurî ket. Qurm û kotik û êzingan kozî girtibûn. Pilotên qurm û daran  
sor

bibûn. Silêman ji cî rabû. Ew pilotane hemû li dora hûriki berevî ser  
hev

kir. Bixwe jî li rex koziya agiri xwe li ser taqa piştê dirêj kir.  
Nermebayekî

divizandê. Nermebayekî weke bayê bilûrê lêdida û ew pilotên  
kozîgirtî,

geş fikir. Silêmanî tişteke xwe ber bi agiri rakêşa û guçkê xwe li agiri  
û li

hûrikê goştî dagirt. Baş dibihîst. Qirmeqirma goştî bû, ko li hûriki da  
diqeliya. Te digot qey sîtilek zeng tijî goşt kirine û diqelînin. Piştî  
demeke

xurt ji cî rabû. Pê darekî ew rejû û pilotên li ser hûriki, da aliyekî. Li  
dû

ra pê gwînîpişîkekê ew argîn û xweliya li ser hûriki gêzî kir û baş vemalt.

51

BILÎCAN

Germayeke tund ji libên xîza daxbûyî radibû. Libên xîzê wekî pilotên agiri sor bibûn. Piştî demekê xîza li ser hûriki sar bû. Silêmanî ew xîz pê

darekê bi hemmet li ser hûriki, da aliyekê. Hûrik li bin xîzê da sor bibû.

Li dû ra ew kevir û selê li ser devê hûriki jî pê darikan rakir û vêda da. Paşê

pê kojê şûtka xwe bi devê hûriki ra girt û du, sê caran hêdîka ew ji cî qilqi-

land. Gava ko hûrik ji cî leqiya, hêdîka hûrik ji nav xîzê da kişande der-

va. Hûrik req û hişk bibû. Destê wî şewitî. Zû hûrik danî erdê. Xwe rast

kir. Li dora xwe nihêrî. Qafreş wêdatir li ser leman ketibû. Silêmanî li do-

ra hûrik ra dest bi pêgermoka kir. Li dora hûriki ra bû turik. Hat û çû.

Da ko zanî hûrik hindekî sar bûye, hate li rex hûriki kundkî rûnişt.

Xencera xwe li ber piştta xwe ji kalani deranî. Pê xencerê rûdiya devê hûri-

ki ko wekî kindirekî req bibû, birî. Gava ko rûdiya devê hûriki hate birînê, ew kaş kir û ji devê hûrik vekir, bi vebûna rûdiyê ra bû fişqîna don

û rûn tevî hulmeke çivir ji devê hûriki ra avîte derva. Hindik mabû  
hulm  
û donê dax ser û çavên wî bişewitanda. Lê baş bû, ko bi vebûna  
devê hûri-  
ki ra serê xwe paşda da. Piştî kişiyana hulmê ji devê hûriki, hûrik  
kûşkê  
sar bû. Vêca Silêmanî bi destê xwe devê hûriki fire kir û xencera xwe  
li  
gehikeke goştê sorbûyî ra kir û bi rakêş ji hûriki kişande derva. Goşt  
li  
hûriki da baş qeliyabû û sor bibû. Dest bi xwarinê kir. Gehikên  
sorbûyî  
bi dilbijiyaneke sosret û bi mirçemirç dida ber arû û piriyan û bi lez  
di-  
gemirand. Nîvê goştê di hûriki da xwar. Hindek jî avîte ber Qafreşi.  
Gava ko lap têr bû, dîsan derê hûriki girêda û kevilê kaviri kişande  
ser.  
Vêca ser û piyên kaviri hema wisan bi post va kire nav agiri. Bêhna  
kozûrekê axar da ber xwe. Dûkeleke çivir ji koziyê quloz bû.  
Li ber koziya agiri hebana xwe da ber serê xwe û hema wisan  
servekirî  
xwe li ser taqa piştê dirêj kir. Nermabayekî sivik divizandê û pirûsk  
ji  
koziya agiri radikir. Çavên wî giran bûn û hêdî hêdî çûne ser hev.  
Baldara  
xewê ew ji vê cîhanê ber bi cîhana pan û berîn û bêsinore xewin û  
xiyalan  
rakêşa.

Hînga serê xwe rakir û dîna xwe dayê çî, istêrên esmani leplepî bûne.

Her istêrek bînanî fenerekê diteyîse. Hewa sar bûye. Cîhan wisan reş û

tarî bûye, ko mirovî li ber piyên xwe nabîne. Pilotên rejûyê û koziya daran vemirîn e. Teviziyên xwe rast kir. Qolinca xwe îşkand.

Qirpeqirp

li pişta wî ket. Rabû ser piyan. Ser û pê li nav rejûya vemirî deranî.

Ser û

pê şewitîbûn. Bi dest jêrçena kaviri jev vekir. Pê xencerê zimanê kaviri jê

kir. Hindek kire devê xwe. Lê xweş nehat. Ser û pêpikên şewitî hema wisan avîte ber Qafreşi. Qafreş li ser û pêpikan ba ket.

52 BILÎCAN

Silêman jî pişta xwe şidand. Dorlaqên xwe qîşt kirin. Çarixên xwe li piyên xwe da wî alî, vî alî birin û anîn û li piyên xwe da rast û qîşt kirin.

Kewanê xwe avîte milê xwe. Tîrdanka xwe li ser milê xwe da ediland.

Destê xwe avîte hûriki û devê wî vekir. Paşê devê hebana xwe jî vekir.

Çend gehikên goştî li hebana xwe da cî kir. Gehikekî mezin jî da destên

xwe. Hema wisan ser piyan li gehiki ba ket û xerîkî xwarinê bû. Binê hûrik da hindek qelî mabû. Hûrik bi wê qeliyê va avîte ber Qafreşi.

Qafreşi hûrik kişande nav lemên xwe û da ber qîlan û kirekir pê xist.

Pêş

da goşt vehêra. Li dû ra ew hestikên gehgehî kirî, da ber didanên  
xwe yên  
kursî û heçê kurûmîtkên ko pê va mabû jî, koşt. Kevilê kaviri jî li wê  
derê  
mabû. Silêman li ber lêva xwe da got:  
»Ez çî bikim Sofî Xidir li vir nîne, ko ez posti bidimê bila ji xwe ra  
bide-  
bixîne û hişk bike û bavêje milê xwe û xwe di postê kaviri da qude  
bike û  
li rex zomeyan bikeve...«  
Bi hanîna navê Sofî Xidiri ra bejin û bala sofî û kiriyarên wî hate bîrê.  
Sofî Xidir sofiyek ji sofiyên bajarokê wan bû. Ew yekî heledirêjî,  
raçandî  
û rûku bû. Ridêna wî dadikete ser navqeda wî. Her dem postekî  
kûviyan  
davîte navmilê xwe û gava ko dibû dema nivêjê, post ji navmilê xwe  
vedikir û li bin xwe radixist û berê xwe dida qublê û dest pê dikir û  
ji xu-  
dayê xwe ra nivêj dikir. Gava ko nivêja wî kuta dibû, tizbiyekî sed û  
yek  
lib ji berîka xwe derdixist û dest bi zikran dikir. Her çend ko sofî  
mirovîekî xudêtirs û bawermend bû, lê zaroyên wî berewajî wî  
hemû diz,  
quldur, rêbir, derewîn, komrevîn û hîlebaz bûn. Digotin kurên wî ne  
tenê nivêjkar û bawermend nînin, heylo diçin sexel û pezên xelkê jî  
didizin û dihînin li ber çavên sofî ser jê dikin û goştê wan dixwin. Pêş  
da

sofî li wan qehirîbû. Lê berebere ewan sofî jî ji rê derxistibûn û kiribûn

hevpişkê gunehên xwe. Digotin sofî dev li goştê diziyê nade, lê avegoşt û

îşkêna qeliya pezê diziyê noşî giyan dike. Gava ko xelkê bigotana sofî; ne

tu sofî û nivêjkar î! Ev çi yeke ko zaroyên te dikan? Sofî dest bi nifiran dikan û digot:

»Ez çi bikim Xudê belaya xwe bide wan mifirdiyên min. Ez pê nikarim,

lê Xudê pê bikare.«

Xelkê jê dipirsîn:

»Başe sofî lê tu çima goştê pezên diziyê dixoy!?«

Sofî dest bi sûnd û bersûndikan dikan û digot:

»Devê min bi goştê diziyê nakeve. Her tenê ez avegoştê vedixom.

Ma

hûnê avê jî ji min ra berbend bikin. Ava xudêye. Av ko naherime. Lê

ma

53

BILÎCAN

ezê devê xwe girê bidim!? »

Bi vê bîreweriyê ra li ber lêva xwe da kenîya û postê kaviri cî da hêla.

Her çend ko hewa tarî bû, lê li tarîtiyê da karê rê kir. Xwe tev pêça û gazî

Qafreşi kir. Lê nizanîn yê kî alî da herin. Li hewa nihêrî. Hewa tarî, lê es-



man sayî û piristêr bû. Di wê demê da istêrek rijiya û bînanî şûrekî zîvîn

sîngê esmani qelaşt û li wî alî çuyan da li ber çavan bezir bû.

Silêmanî xwe ji xwe ra got:

»Gelo eva istêrka bextê kê bû rijiya?!«

Li dû gotina xwe ra xwest ko rê keve. Lê hewa hind tarî bû, ko li ber piyên xwe nedidît. Bîstekê rawesta. Çavên xwe kuskusand û guçkên xwe

dagirt. Xuşîna avê bera wî li ser xwe da rakêşa. Xwe ber bi dengê avê

kişand û di gel ava kaniyê jor da xwe ber bi binê newalê berda. Li serber-

jêri da bi pêxişk jorda diçû. Dengê aveke boş seha wî li ser xwe da rakêşa.

We diyar bû ko ava kaniyê diçe tevî çemekî dibe. Terka ava kaniyê nekir

û di gel wê li berjêri da şiqitî. Serberjêri gelekî kişand. Du, sê qelûnkêşan

zêdetir kişand, ta ko gihîşte rastiye. Hindî ko nêzîkî bi rastiye fikir, hind

diçû dengê avê bilind û bilindtir dibû. Ew û ava kaniyê tev giheştin rex

çemekî giran Li her alî avên kanî û belekiyan tevî hev dibûn û dibûne çe-

mekî boş. Li rex çemi ket û berjêr daket. Hurmehurma avê jê ra bibû rênîşander. Piştî demeke xurt seha tîhnîtiyê kir. Lê dizanî ko ev avana piş-

ka zortir avên belekiyane. Avên şêlû û tevda gild û gemarin. Avên  
tev da  
lîl û herîn e. Avên lîlavîn e. Taze eger ev avan şêlo jî nebin, kêrî  
vexwar-  
inê nayên. Tama lîl û heriyê ji wan tê. Bi hîviya peydakirina  
kaniyekê,  
kete rex çemi. Hurmîna çemi bû. Silêman hema wisan ketibû rex  
çemi û  
pêş da diçû.  
Qafreş jî li rex çemi ra ketibû çerxê. Goştê nêçîrê dema wî jî saz  
kiribû.  
Vî alî, wî alî bêhin hildida û erd pêkol dikir û li ser tûm û qolan da  
dimîst.  
Qafreşi ko hema wisan bêhin digerland, dakete binê kendalekî. Paşê  
dengê çelpeçelpa wî bera Silêmanî li ser xwe da rakêşa. Silêman ber  
bi  
çelpeçelpa Qafreşi çû. Dîna xwe dayê Qafreş waye li binê kendali da  
li ser  
leman ketiye û avê diçelpîne. Gava ko baş dîna xwe dayê, dît ko  
kaniyek  
waye li binê kendali da hildikele. Dakete binê kendali. Bîne ya xwe  
di ava  
kaniyê da dît. Bîneyên istêran jî li binê kaniyê da çavên xwe li wî  
diqir-  
pandin. Xwar bû. Pê destên xwe pêşiya kaniyê veda. Demekê  
rawesta.  
Hindek av ji kaniyê kişiya. Paşê xwe li ser herdu destên xwe da avît  
û li ser

çokan li ber avê teliya. Qurûyî avê bû. Du bêhnên xurt av vexwar.  
Aveke

sar û tevizî bû. Li rex kaniyê kundkî rûnişt û bêhna xwe veda. Serê  
xwe

#### 54 BILÎCAN

bilind kir û li esmani nihêrî. Esman bînanî palaseke reş, ko pê  
gulmîrxên

zîvîn neqîşandibin, diçilvilî. Gijegija şevê bû. Demeke xurt li ser  
kaniyê

rûnişt. Gelek av vexwaribû. Giran bibû. Zikê wî perçifîbû. Dixwest  
perça

wî danê. Nizanî li kêderêye. Li bîr û hizran da cûm bibû. Geh li bara  
apê

xwe da, geh li bara mîrê tazerabûyî da, geh li bara şivanê wê rojê û  
xelen-

dorê wan û geh jî li bara nêçîra xwe ya duhî da dihizirî. Nişkava  
dengê

kundekî hevo û firêtên bîr û hizrên wî jev pizirand. Ji cî rabû.  
Serçokên

xwe dakuta û xwe qîşt û qivrax kir û li ser kendalî ket û guhê avê ra  
girt û

gazî Qafreşi kir û di gel avê berjêr bû. Hurmehurma avê û  
girmegirma

piyên wan tevî hev bûn û li reşatiya şevê da wenda bûn.

55

#### BILÎCAN

6

Kutaya meha Adarê ye. Her tenê li serê çiyayên bilind, kevî kevî berf maye. Berfê mêjve ye, ko xatirê xwe ji deştê ji banî û bêlanan xwestiye.

Êdî vaye li banî û bêlanan da li cîhê berfê gul, giya, çiçek, kulîlk û pin-

carên cur be cur erd himêz kirine; kulîlkan li banî û bêlanan da dîlana

buharê girtine. Silêmanî çiya hemû li pişt serê xwe ra hêlaye û daketiye

deştê. Li dilê deştê da girikekî dombelî hilavîtiye. Silêman ber bi wî girikî

şûlikî. Li ser giriki ket. Li bintara giriki da hindî çavan qeter dikir, deşteke

vekirî bû, ko berve diçû. Silêman daliqiyayî daliqiyayî li ser giriki ra berjêr

ber bi deştê şiqitî. Deşt bînanî mafûreke Hawşarê rengrengî diçilvilî. Çe-

mekî zirav li panatiya deştê da weke marekî zîvîn çivane dibû û ta çavan

didît, li dilê deştê da lev digeriya û li binê deştê da li ber çavan wenda

dibû. Nermebayekî divizandê û bêhina kulîlkên buharî belawî axaran

dikir. Li ber bêhna kulîlkan mest û gêj bûye. Xwe li cîhaneke taze da dibîne. Li cîhana gul û sosin û kulîlkên rengareng da. Li cîhana reng

û

deng û saz û awazan da. Li her alî dengê qaz û quling û reşolekan,  
nalîna  
serkesk û şalûl û bilbilan, qebeqeba kewan û gimegima kotiran,  
qûtîna  
eluh û qîjîna qertel û nalîna dalaşan tê. Baldarên buharî refrefî bûne  
û li  
pêsîra deştê da, li rex avên kanî, gol, golmanc û rûbaran da lev  
digerin. Li  
bersîngê esmanê şîne bê binî da refên sîh û qaz û qulingan lev  
digerin û li  
nava gul û gîhayan da didanên û qolqolî dibin.  
Silêman li ber deng û sedayên curbecur mest û gêj û xêv û serxweş  
bûye.  
Gavekî rawesta û li temaşa suruştê da noqim bû. Vir da wê da mêze  
dikir.  
Li ber piyên xwe nihêrî. Pincarên cur be cur li ber piyên wî lev  
aliyabûn.  
Li damêna giriki li ser kevirê ko bînanî kevirê bêriyê bû, rûnişt.  
Kûşkê  
bêhna xwe veda. Tava şîrogerme buharî zeliqandibûyê. Demeke  
xurt li  
ber tavê rûnişt. Hebana wî mêjve bû, ko vala mabû. Hebana wî  
mêjve bû,  
ko li xwazîka hindek nanên ker û kût da dinaliya. Qurequra zikê wî  
bû.  
Rabû ser xwe, dest pê kir, bînanî ajelan xerîkî çêrînê bû. Her çî  
pincarên

xwarinê ko nas dikir, li her yekê hindek çinî û xwar. Li dû ra dest avîtê,

tîrek ji tîrdanka xwe deranî û li ser çokan ket û çend alekok çinî.

## 56 BILÎCAN

Alekokên gir û kizir. Alekokên ko çinîbû, yekoyeko danî ser kevirekî û bi

kevirekî jî lêda û qalçikên wan jê vekir. Hindek alekok hema firix ji nav

qalçikan derdiketin. Evan alekokên giheştî bûn. Ev alekokana wekî çe-

qalokên badaman kizir bûn. Şîrekî sipî wekî şîrê mîhan jê dinuqutî.

Li

ber lêva xwe da got:

Alekokê pirçinê!

Berdilka dilê minê!

Min şureşur ketiye binê!

Hatime halê mirinê...

Îca bi xwendina vê helbestokê ra, li ber lêva xwe da keniya û got:

»Kurê berfê dest ji te nakişîne. Ewê dîsan karê zemawendê bike.«

Xwe ji xwe ra dipeyvî û li rewşa xwe dikeniya û pincar vedihêra.

Piştî xwarina pincar û alekokan li nav gul û sosin û mêrg û çîmenan ra

da rê. Li nav rengên curecure da pêş da çû. Ta roja îro ev hemû reng we-

ha li ciyekî da li rex hevdu nedîtibû. Li temaşa gul û kulîlkan da cûm bibû. Bo demekê hemû tişt ji bîr kir. Giheşte terazinekê.

Mamsosinan li

nava terazinê da ustuyên xwe li ser hevdu da xwar kiribûn û li nava teraz-  
inê da bijiqîbûn pincarçinên navça wan hate bîrê. Dema buharê ko pin-  
carçinên navça wan diçûne pincari, bêy mamsosin ji çolê nedizivirîn.  
Keç  
û bûkên pincarçin ev mamsosinan çepikçepikî girêdidan û li ber xavik û  
girdêle yan jî li ber şûtikên xwe da dadiçikandin. Yan jî li ber sîng û pêsîrên xwe ra dikirin. Bi van bîreweriyana ra dest pê kir, çend mamsosin  
çinî û da ber difina xwe û pir bi dil bêhn kir. Bêhna mamsosinan ew mest  
û gêj kir. Li nava gul û çîçek û giyayên levgeriyayî da lev digeriya, ko dengê seqan ew li nav deriyaya xewin û xiyalan da deranî. Qafreşi dêla  
xwe kiribû nav lingên xwe û xwe avîtibû pişt wî. Silêmanî dîna xwe dayê  
çi, du, sê se bi rev, ber bi wan direyên û tîn. Seqan dêla xwe dabûne ser  
milên xwe û girmegirm ji binê piyên wan dihat. Silêmanî gurzê xwe ji bin  
kewşê xwe derxist. Lê dengê ko gazî seqan dikir, se li ser wan, da zivi-  
randinê. Seqan erd pêkol kirin û bi rewterewt ber bi xûyê dengî zivirîn.  
Se li wan dûr diketin, ko dengedengê bera Silêmanî li ser xwe da rakêşa.

Silêman li ser milê xwe yê rastê da zivirî. Kulotekî bînanî dîwaran  
sûrmil  
kişandibû. Ber bi wî kulotî meşî, li ser wî kulotî ket. Gava ko li ser  
kulotî  
ket, dîna xwe dayê, zomeyeke giran vaye li besta pişta kuloti da  
daniye û  
li binê bestê da berve çûye. Hejmara istêrên esmanan heye, lê  
hejmara  
57  
BILÎCAN

xîvetan tuneye. Xîvet li ber hev ra bi rêk û pêkiyeke balrakêş li pêsîra  
deştê  
ra dest pê dibûn û ber bi binê rastiyê diçûn. Ser û binê zomê bi hev  
va  
nedihate xûyanê konên reşe erebî û xîvetên sipîçîl weke kuvarkan  
der û  
deşt dabûne ber xwe. Naweya li nîveka wî û konan da gelek bû. Li  
qasekê  
da ew naweya rapîva û xwe gîhande nêzîkiya konan. Seyên malan  
bi dîti-  
na mirovekî nenas ra, ko seyekî ji weş ketî jî dabû dû xwe, hêriş birin  
ser  
wan. Seqan li qasekê da xwe bi wan ra gîhandin. Silêmanî dîsan  
weke  
caran gurzê xwe ji bin kewşê xwe deranî û xwe û Qafreş ji devên  
seqan  
parast. Dengê ji nav konan hat, ko gazî dikir:



»Kuro nehêlin! Seqan ew rêvîngê hane belaw kirin! »  
Di gel wî dengê ra, du, sê kes bi hev ra ji nav konan derketin û xwe bi rêvîngi ra gîhandin û xwe dane pêşiya seqan û Silêman û Qafreş ji nav lep û çengên seqan rizgar kirin. Ew mirovane weha mat mabûn, li Silêmanî dinihêrîn. Xortekî bejinbilindî, navziravî, bi zend û bend, li timtêla pehlewanan da, kewanak li milan, gurzek li binçengan, tîrdankek tijî tîr li ser milê çepê bera wan mirovana li ser xwe da rakêşa û han dane seha kunckoliya wan. Yekî ji wana ko kalemêrekî rûko bû, taba xwe nehanî û pirsî:  
»Bira pirsiyar bê xewş e. Tu ji kû têy û tu yê kû da herî?«  
— Ez mêvan im apo.  
— Ay li ser ser û herdu çavan!  
— Bibexşîne ev zoma kêye? Silêmanî pirsî.  
Wan her sê mirovana bi vê pirsiyara Silêmanî ra li nav çavên hevdu ni-hêrîn. Dîsan heman ewê ko jê pirsîbû, tu ji kû têy û tu yê ko da herî, gotê:  
»Ev zoma Eliyê Siwaraye.«  
Bi bihîstina navê Eliyê Siwaran ra, rengê Silêmanî hate guherînê. Tiştêk li nav dilê wî da lev geriya. Lê li ser xwe va neanî û pirsî:  
»Bibexşe apo mala Eliyê Siwaran kîjane?«

Dîsan ew mirovane sosretmayî li nav çavên hevdu nihêrîn û dîsan kalo

bersiva wî da:

»A..., ew mala hanê, ko li serperê malane, mala Mîrî ye.«

Îca pê tiliya xwe ya amanalêsê mala Mîrî nîşanî Silêmanî da û gote hevalekî xwe:

»Oro Zinar diyar e, ev ji rêyeke dûr ra hatiye. Nenas e. Were li pêşiyê keve û ewî bibe mala Mîrî. Ev rengê teteran dide. Rengê teterên mîr û be-

gleran. Diqewime ko hema teter be jî. Lê nizanim ew çawa seye pê ra?!«

Mirovek ji wan du, sêkana ko gencekî reşesmerî û qor bû, kete pêşiya

58 BILÎCAN

Silêmanî û ber bi mala Mîrî çûn. Ta ko giheştin serperê konan.

Kon wisan li ber hev û pişt hev ra rêz û serast hatibûn vegirtinê, te dig-

ot qey endaziyarekî kirarî, ko serê xwe li kêşana nexşeyên bajaran da sipî

kiriye, nexşa vegirtina van konan kişandiye. Zome wekî sûk û bazaran

kolan bi kolan û şeqam bi şeqam hatibû parvekirinê. Mirovî dikarî giştî

şeqam û kolanên wê bihejmarta. Lê hejmartina wan hemû şeqam û

kolanana jî dîsan he karê endaziyar û hejmarvanan bû.

Li rê da binasê wî jê pirsî:

»Erê bira te negot, ka tu teterê kîşk mîrî yî?«

Bi bihîstina navê teterê mîrî ra, dîwanxana bavê wî, hatina teterên mîr

û began, teterên dewletên dereke bo dîwanxana bavê wî hate bîrê û ke-

sereke kûr kişand û bersiv da:

»Teterê çi bira?«

— Bibexşîne, min got qey tu teterî. Lê tu ji ko têyî û karê te li mala Mîrî

çî ye?«

— Ez ji xwe ra li rênçberiyê, li şivantiyê digirim.

Gava ko binasê wî navê rênçberiyê û şivantiyê bihîst, rawesta û zende-

girtî pirsî:

»Birastî tu li rênçberiyê digerî?«

— Erê rastî. Ezê çima derewan bikim?

— De baş bû, ko te zûka got. Hindik mabû min tu bibiray xîveta Mîrî.

— Ma em biçûyana xîveta Mîrî, yê çi biba?

— Na birayê min. Her kes nikare here xîveta Mîrî. Tenê teterên mîr û

mîrekên kurd û mêvanên bilinpaye diçin xîveta Mîrî. Cîhê mêvanên dî

cuda ye.

Silêman li nav hişê xwe da çû. Dîwanxana bavê wî wisan nibû. Li cem

bav û kalê wî hemû kes beranber bûn. Her kê bihata yeksere diçû dîwanxanê û bavê wî bixwe li ber mêvanan va radibû şipê û ta ko mêvan

nerûniştana, ew nederûnişt. Silêman li nav van bîr û hizrana da bû,  
ko gi-  
hîştin ber derê konekî mezin; konekî reşî erebî li ser çendik û çend  
istû-  
nan hatibû vegirtinê. Silêmanî karî hundurê konî bibîne. Hundurê  
konî  
bi perdeyên rengareng ji hev hatibûn veqetandinê. Li bintara wî  
konê  
mezin da, konekî biçuk jî vegirtibûn. Li panavka serê girî, durust li  
textê  
panavkê da xîveteke bi gupik û şurik dûrva bera mirovî li ser xwe da  
radikişand. Li bintara xîvetê kaniyeke kêzînkirî dihate xûyanê. Li  
lûlka  
kaniyê ra aveke zelal hindî lûlika lûlehengekî bi guj difîşqande  
derva.  
Pîrejineke tevgirêdayî û bi gêre û vêre derkete ber derê konê reşî  
mezin.

59

BILÎCAN

Pîrejinê pişteke rîse rengareng dabû piştta xwe. Kofiyeye qûç ko  
doran-  
dorî wê çareke rengîn lê alandibû, dabû serê xwe. Pîrê hema wisan  
li ber  
derê konî rawestayî pirsî:  
»Kuro Zinar ew kî ye?«  
— Dadê dibêje, ez ji xwe ra li şivantiyê digirim.  
— Şivantî?!

— Erê!

— A, bibe xîveta rênçberan!

Îca pê tiliya xwe xîveta reşe biçûk, ko li bintara konê reşî Erebbî hatibû

vegirtinê, nîşanî wan da û dîsan çû, kete hundurê konî. Silêman û Zinar

jî tev çûne wê xîveta ko pîrê nîşanî wan dabû. Zinarî li goşeyeke xîvetê cî

nîşanî Silêmanî da û bixwe jî xatirê xwe ji Silêmanî xwest û derkete derê.

Silêmanî tîr û kewanê xwe ji milê xwe şiqitand û tik û tenê li goşeyeke

xîvetê da rûnişt. Tîr û kewan û gurzê xwe jî danî kêleka xwe. Li hundurê

xîvetê da çend tatikên rengorengo raxistibûn. Rast bû, ko xîvet tiştekekewin bibû, lê diyar bû, ko li demanê xwe da xîveteke giranbuha û

bi xemil û çîç bûye. Diqewimî ko demanekê xîveta Mîrî ya zavatiyê bûbe.

Lê niha ko kewin bûye, bûye xîveta rênçberan. Silêman li nav van hizrana

da bû, ko pîrê hate ber derê xîvetê û hema wisan li ber derê xîvetê rawes-

tayî, serçavanî da Silêmanî:

»Bi xêr hatî kurê min!«

Silêman bi dengê pîrê ra ji cî rabû û destê xwe da sîngê xwe û zor bi tore

û li ser xwe bersiva pîrê da:

»Ez destên te radimûsim. Li nav xêran da bî dadê .«

— Rûne! Rûne! kurê min. Tu ji kê derê têyî?

— Ji Zozanan têm.

— Heylo ji Zozanan ?! Çi qewimî ? Li çi digerî?

— Ez ji xwe ra li şivantiyê digirim.

— Na lo!..Dema mercê şivanan jî hindekî derbas bûye. Rûnê! Rûnê!  
Niha Ehmed Begî yê bê û te bibîne.

Pîrê ev yek bi dilekî şewat got û li ber derê xîvetê paş da zivirî.

Silêmanî hê cîhê xwe germ nekiribû, ko du, sê kesên dî jî yek li dû  
yê dî

ra hema wisan bêy axiftin û bêy silav û serçavanî hatin û her yek li  
goşeyek

xîvetê da rûniştin. Çi kesî li gel yê dî nedixift. Bêdengiyeke rişt li  
xîvetê

da fermandarî dikir. Demeke xurt li nîvro derbas bibû, ko rênçberên  
malê jî bi ken û henek daketin hundurê wê xîvetê. Nêzîkî neh, deh  
kesan

bûn. Di gel hev yarî û henekên tund û rût dikirin. Kesî ji wan jî qet  
serça-

60 BILÎCAN

vanî nedane ewên tazehatî. Te digot qey evanê tazehatî, hatine li  
ser wan

hevû. Dema ko rênçber hemû li xîvetê da rûniştin. Du, sê kesan  
sêniyên

firavînê ji wan ra hanîn. Firavîn pilawsawar bû. Pilawsawar hema  
wisan

berdabûne nav sêniyan û li her layekî sêniyan da jî çend nanên li ser  
hev  
da qetkirî danîbûn. Bo her pênc kesan sêniyeke firavînê hat. Sêniyek  
jî ji  
bo ewanê tazehatî hanîn. Rêncber bi dest û lepan li sawarê ba ketin.  
Nan,  
nanê sêlê bû. Nanê sêlê didane ber destên xwe û dikirin parî û li  
sawarê  
da badidan. Silêman jî zor birsî bibû. Parî li sawarê da badida û li ser  
sêniyê digivaşt û parî li dû pariyan ra ditemisande gepa xwe. Û  
hestikên  
goştî ko rûn jê dinuqutî, dikişande ber arû û pirûyan. Yekî heledirîjî  
rû bi  
xurî jî hema wisan li ser serê wan ra rawestabû û li xwarina wan  
dinihêrî.  
Ewê li ser serê wan ra rawestayî carê bi heceta ava vexwarinê, yan  
bi  
berhaneya wê hindê ko bizanibe, xwerek li ber kê heye û li ber kê  
tuneye,  
dihat û diçû û dîna xwe dida xwerekxwarina wan. Te digot qey  
pariyên  
wan dihejmêre. Hevalên Silêmanî bi dîtina wî kesê ko li ser wan ra  
di-  
geriya, fedî dikirin û bi şerm xwerekê xwe dixwarin. Lê Silêman  
gelekî  
birsî bibû. Êh li ber çavên wî ra nedihat, ko yek waye li ser serê wî  
ra

rawesta ye û pariyên wî dihejmêre. Bi dil û can xerîkî xwarinê bû.  
Hemû  
li ser sêniyan paş da vekîşiyabûn, ko Silêmanî hê jî dixwar. Silêmanî  
hîn-  
ga serê xwe li ser sêniyê hilda, ko li binê sêniyê da ji çend hestikên  
rege rût  
pêve, çî tişt nemabû. Xûyeke zeliqokî li ser eniya wî rûniştibû. Pê  
pişta  
destê xwe eniya xwe paqij kir û pişta destê xwe li şûtika xwe sût û  
li ser  
sêniyê paş da vekîşiya. Yekî ji wanê ko tevî Silêmanî xwerek dixwar,  
berê  
xwe li ser da kir û gotê:  
»Te têr xwar bira?«  
Silêman soromoro bû, lê li ser xwe va neanî û got:  
»Erê Yezdan zêde ke! Min têr xwar.«  
Rêncberan sêniyên vala birin aliyê malê û bixwe jî çûne dû kar û  
barên  
xwe. Tenê Silêman û ew sê, çar kesên dî , ko ewana jî bînanî  
Silêmanî li  
rêncberiyê digeriyan, li xîvetê da man. Heman ew mêrkê heledirêjî  
rû bi  
xurî, ewê ko gava firawînê li ser serê wan ra sekinîbû, li aliyê malê  
hat û li  
ber derê xîvetê rûnişt. Wekî bikiran careke dî jî li wan kesên ko li  
xîvetê  
da rûniştibûn, mêze kir. Destê xwe li rûyê xwe gerand. Çena xwe  
xurand.



Devê xwe temijand. Sîngê xwe paqij û dengê xwe xweş kir û got:  
»Gelî rênçberno! Ehmed Begî dibêje hûn dereng hatine. Me  
rênçber  
hemû girtine. Me tenê du dajo divên. Yek dajoyê mihiyan û yê dî jî  
da-  
joyê pezên istewr. Niha li nav we pênc kesana da ezê her tenê du  
kesan

61

BILÎCAN

bibijêrim. Ez nizamim hûn deba vira dizanin, yan na? »  
Îcar xwe ker kir, ta ko bersivekê bibihê. Lê deng ji çi kesî derneket.  
Diyar bû, ko çi kes ji wan mebesta mêrkê rû bi xurî nizane. Diqewimî  
ko  
bizanibiyana jî, lê çi kesî bersiva wî neda.  
Mêrkê rû bi xurî peyê gotinên xwe ra girt û got:  
»A..., diyar e ko hûn deba vira baş nizanin. Deba rênçbergirtina vira  
weha ye. Vira eger rênçberekî nenas bigirin, pêş da sêniyeke  
xwerekê jê ra  
dînin. Yekî bînanî min jî li ser serê wan ra dibe fermanber û li  
xwereka  
wan dinihê re. Eger ew rênçberê nenas li xwereka xwe da jêhatî û  
devjîr  
be, bizane ko li kar û kirdarên xwe da jî jêhatî û çelenge.  
Kalê rû bi xurî bi vê gotina xwe ra xwe kenand û pê ra jî qisedana  
xwe  
domand :

» Lew ra ez li ser serên we ra rawestabûm û min bi gotenî pariyên we di-

hejmart. We hemûyê bixwe jî didît, ko ew gencê hanê çawa xwerek dixwar. Çendê jî piştî we li ser sêniyê paş da vekîşiya.«

Îca pê tiliya xwe Silêman nîşanî wan da. Serî hemû li ser Silêmanî da zivirîn. Hemû mat mabûn li Silêmanî û li bejin û bal û timtêla wî dini-hêrîn. Te digot qey hema taze wî dibînin. Qet eva danekî rojê nîne, ko li

bal hev, li bin xîvetekê da rûniştine. Silêman li wê demê da wekî pehle-

wanakî hate ber çavên wan. Yekî ji wan taba xwe neanî û got:

»Apo ev ne ji me ye. Ev rengê pehlewanan dide. Qet rengê rênçberan li

wî nakeve.«

Yekî dî jî hilda û got:

»He rastî jî ev pehlewan e. Eva ne tê ye. Tu li gurzê wî. Tu li tîr û ke-wanê wî. Tu dibêjî qey yê here şerê Rostemê Zali!«

Yê dî got:

»Mamo vî ji nav me derîne! Ew ne tê ye. Ew mirovekî avarte ye. Ew li

rênçberiyê nagere. Mirovî nizanê ew rênçbere, şervane, nêçîrvan e, pehle-

wan e çî ye?«

Mêrkê rû bi xurî got:

»Na, na ... Ew bixwe waye dibêje, ko hatiye li rênçberiyê digere.

Bixwe

jî li we hemûyan çelengtir e. Ew dajoyê mihiyaye. Yê dî jî, a, ew gencê

han e. Ewî jî xwerekeke bi ser û ber dixwar. De, bi xatirê we! Ez va çûm.»

Kalê rû bi xurî, bi vê gotinê ra ji ber derê xîvetê rabû û ber bi xîveta mêran çû. Ew her sê kesên bêkar mayî, bêy hemdê xwe ji cî rabûn.

Patika

xwe xurandin û bêy wê hindê ko xatirê xwe ji herdukên mayî bixwazin,

ji xîvetê derketin. Silêman û gencek di xîvetê da man. Herdukan bi hev

62 BILÎCAN

ra xeber jî nedidan. Serê xwe xistibûn ber xwe û kûr diponijîn.

Piştî demeke xurt, xortekî bejinbilindî navziravî li hindav da hilkişiyayî ji xîveta mêran derket û ber bi xîveta rênçberan hat. Ew mêrkê

heledirêjê rû bi xurî jî dabû dû wî. Mirovî dil nedida, li bejin û bal û timtêla xortî binêre. Destek şal û şapik lê bû, kulozekî sipîçîl bînanî keleqendê Kela Xoyê li serî bû. Çareke armûşîne reşe bi rişî li dora ku-

lozî alandibû. Rişiyên çarê dadiketin ser kosteka demejmêrê. Şurikên

kostekê daketibûn ser kemberê. Şûtikek armûşîne rengrengî li navqe-

da xwe alandibû. Xencerek tetikzîv li ber şûtikê ra bû. Cotek gîzmên reş di lingan da bûn. Gîzme ta binê çokên xwe hilkişandibû. Gîzmên wî dibiriqîn û rewneqa wan difirîn nav çavên mirovî. Xortê zirav hate

ber derê xîveta rênçberan. Li ber derê xîvetê rawesta û serê xwe li derê

xîvetê ra kire hundur û hema wisan li ber derê rawestayî ji mêrkê rû bi

xurî pirsî:

»Ev herdu mane?«

— Belê ezbenî.

Li dû wê pirsê xwe ra hema li ber derê, bêy serçavanî, berê xwe li ser Silêman û hevalê wî da kir û got:

»Kemo yê heqê we ji we ra bêje. Hûn diçin ber pezî baş li xeberdaniya

sereşivanan da bin ha!«

Paşê berê xwe li ser Kemoyî da kir û gotê:

»Heqê wan ji wan ra bêje û herduyan jî bide Mihoyî, bila hema niha bibe bispêre sereşivanan«

Eva got û li ber derê xîvetê paş da zivirî. Silêman û hevalê wî li nav çavên hevdu nihêrîn û serê xwe kirin ber xwe da. Kemoyê rû bi xurî hate

hundurê xîvetê û got:

»Ev Ehmed Begî kurê Mîrî yê mezin bû. Pirtûk û perok û hejmara keriyên li destê wî daye. Ew li ser şivan û rênçberan ra digere.

Nizanim

we hay jê heye, yan na? Vêderê heqê şivanan her pêş da hatiye birînê.

Tiştêke vebirî ye. Heqê dajoyê mihiyan ji bo merceke şeş mehî şeş berx û

sê hiriyên mihiyan û destek cilkên nîvtaşe. Heqê dajoyê pezê istewir jî her

merceke şeş mehî pênc berx û sê hiriyên kaviran û destek cilkên  
nîvtaş yê

Mîrî yan jî yê kurên wî ye. Hemîn xwerin û vexwerina we jî li kîsê  
mala

Mîrî daye. Gotinek we tune?«

Silêman û hevalê wî herduyan pêkve serê xwe hevraz avîtin û gotin:

»Ne,e!«

Kemo bi vê pirsîyarê ra ji xîvetê derket û gazî kir:

63

BILÎCAN

»Kuro Miho were van herdu dajoyana bibe bispêre sereşivanan û  
bizivire!«

Miho hat û li ber derê xîvetê rawesta û gote wanên ko li xîvetê da  
bûn:

»Hero xwe teyar bikin, emê rê kevin!«

Silêman û hevalê wî ji cî rabûn û xwe tev pêçan û pêkve ji xîvetê  
der-

ketin derva. Çavên Silêmanî bi Qafreşi ket. Qafreş hema wisan li rex  
xîvetê li ser leman ketibû û xwe kiribû girê. Rêncberan hindê  
nanên hûr

avîtibûn ber. Lê Qafreşi tirsê seyên zomê ew nana he nîvxwarî  
hêlabû.

Dema ko Qafreşi çav bi Silêmanî ket, ruh kete ber û rabû şipê û  
kewû-

jekên xwe rast kir. Li dû ra dest pê kir ew hûrdenanên li erdê berev  
kir.

Silêman li ber rawesta, ta ko ewî giştî nanê li erdê xwar. Paşê bi dengê

Kemoyî ra, ko gazî kir:

»Kuro Miho hûn hê rê neketine?« Her sêkan dane rê. Qafreşi jî da dû

wan. Hindî ko li nav zomê derneketibûn, Qafreşi xwe lemisandibû. Dûlka xwe kiribû nav lingên xwe û xwe vî alî, wî alî davîte ber pesêva Silêmanî. Lê dema ko ji zomê dûr ketin, Qafreşi dîsan fenanî caran dûl-

ka xwe da ser milên xwe û kete pêşiya wan û simsimî û bêhin gerand û

erd pêkol kir.

Daketibûn rastiye. Deşteke ripe rast li ber piyên wan berve diçû..

Hindî çavan qeter dikir, deştê li ber gulezerên pîzpîzkê zer û qîçik dikir.

Li nav gulezeran ra derbas bûn. Li milê çepê kulotên vegirtî ji halhalkan

bera wan li ser xwe da rakêşa. Halhalkan weke mêzereke sore gevez ew

kulotana vepoşandibûn. Li nav halhalkan ra derbas bûn û li ser kulotan

ketin. Gava ko li nav halhalkan ra derbas dibûn, Mihoyi çirtikek avît û ev

helbestoka bi teqil xwend:

Kiçkên xala

Çûn halhala

Zik tijî kir

Tûrik vala

Vêca bi xwendina helbestokê ra bi tiplequtanê û tilîfistiqanê da çirtikan

û xwe helavît. Herdu heval pê kenyan.

Best û kulotên halhalkan li dû xwe ra hêlan. Berê wan ketibû ser çiyar.

Çiyar weke pêşmergên hev girtî dest dabûne destên hev û ta çavan qeter

dikirin, pêşve diçûn. Serê wan hê jî li berfa kever da sipî dikir. Hêdî hêdî

ji deştê diqetiyar û digeheştin damêna çiyar. Li qontara çiyar dîmen di-

#### 64 BILÎCAN

hate guhestinê. Vira li cîhê halhalkan, beybûnên sipî ber û best dabûne

ber xwe. Beybûnên sipî dawêna banî û bêlanan teqalteqalî bi rengê sipî

neqîşandibûn. Li berpala kulotan gereke mezin bînanî guroverkeke bi

dest kişandî, dihate xûyanê. Li nav wê gerê ra derbas bûn. Li naverasta

gerê da xîdik û mendik li hev aliyabûn û dihavîtin ser serê wan. Silêman

li dîtina wan dîmenên rengareng da mabû zendegirtî. Hindî li ber dava

diya xwe ketibû, ciyekî weha xweş û rengareng nedîtibû. Hindî çavên

xwe li cîhana ron vekiribû, ne li Aranê û ne jî li Zozanê cîhekî wiha xweş,

dîmeneke wiha rengrengî nedîtibû. Rast bû ko zozanên wan zozanên bi

nav û bang bûn, lê ev dera tiştekedî bû. Çêre û çirvan lev aliyabûn.

Mêrg

û çîmen tevî hevdu bibûn, kulîlkên sipî deşt û çiya bi hev va dirûbûn.

Halhalkan xêliyeke sore gevez dabûne serê girik û kulotan.

Pêkve xwe dane berpalekê. Li pêşiya wan rizdeberekî sipî bînanî ke-  
layeke mêjîn û asê li hindav da hilkişiyabû. Li binê rizdeberan da  
kaniyeke ron weke çavên kewjalê, hildikeliya. Ava aşekî ji ber kaniyê  
dik-

işiya. Tavê li kaniyê dabû û rewneq diketê. Qîjîna eluhan Silêman ji  
nav

deriyaya hizran da deranî. Cotek eluh li ser serê wan ra ger lêdidan.

Hemû tev rawestan û li eluhan mêze kirin. Eluhan durust li ser

bilindtirîn qûça rizdeberan hêlûn danîbûn. Qirş û qal û pûş û  
pelaşên

hêlûna wan dûr va dihate xûyanê. Li bin rizdeberan ra derbas bûn.

Gava

ko giheştin binê rizdeberan, deng û heraya eluhan hindî çû zêdetir  
bû. Li

binê rizdeberan li rex kaniyê rûniştin. Her yekê kulmek av avîtin  
serçavên

xwe û kulmek jî vexwarin. Ava kaniyê bînanî teyrokê sar bû. Mihoyî  
gote

wan:

»Vira ra dibêjin kaniya eluhan. »

Bîstekê li ser kaniyê rûniştin û bêhna xwe vedan. Hê jî qûtîna eluhan  
bû. Eluhan hêvirze danîbûn. Paşê Mihoyî got:



»Ev eluhane serê me birin. Rabin em rê kevin! Dereng e. Rêya me dûr

e. Çû êvareke dereng em bigîjin keriyên »

Bi gotina Mihoyî ra tev rabûn. Berê wan ketibû serhevrazekî bilind û

bi xîştora. Li nav xîştora ra derbas bûn. Bi helkehelk li ser xîştora ketin

û li pêşîra beroji ra qulibîn aliyê nizari. Vira erd pêrge bû. Ormexa kewn

û taze lev aliyabû û bînanî tatiyekî lê hatibû. Mirovî nikarî xwe li ser ormexê bigrta. Kevî kevî berf jî hê li pêşîra nizari da mabû. Li serê qûçê

rawestan. Li dû xwe ra li rêya ko tê ra hatibûn nihêrîn. Deştê dûrva weke

perûyekî rengareng bi wan va xûya dikir. Zome gelekî dûr mabû.

Silêmanî bi zorê karî li nav leylana berî êvarê da kimê xîveteke sipî li pişt

65

BILÎCAN

girikekî ra bibîne. Piştî bîstekê dîsan dane rê. Li pêşberî wan çiyayekî serkever dihate xûyanê, ko li hindav da hilkişiyabû. Mihoyî gote wan:

»Ev çiyayê Hindiş e. Hindişa vî çiyayî zor bi nav û bange. Debê ko em

li damêna Hindişî ra derbas bibin û xwe bigehînin aliyê dinê, kerî hemû

niha gereke li pişta Hindişî da bin. Ji wî çiyayê hanê ra jî ko a..., serê wî

bi zorê tê xûyanê, dibêjin çiyayê Zemherîrê.«

Li dûr va serê çiyayekî li nav mijê da bi zorê dihate xûyanê.

Silêman û hevalê wî çî deng nekirin. Tev bi pêxişik li pêşîra wî nizarî ra

berwarkî daketin xwarê. Li şiverêykê ra derbas bûn û xwe dane pêşîra wî

çiyayê bilind. Li ser çend keviyên berfê ra derbas bûn. Berf aviyabû û

bibû roqav. Berf li ber çarixên wan dişiqitî. Piyên wan digihîşte erdê û

çarixên wan li heriya binê berfa aviyayî da çik dibû. Hêdî hêdî berwarkî

li ser sîngê Hindişî ra daketin û qulibîn aliyê dinê. Nişkava rastî geliyekî

kûrî bêbinî hatin. Mirovî nikarî binê geliyî bi başî bidîta. Lêre debiya jor

da daketana binê geliyî. Hevalê Silêmanî bi dîtina geliyî ra rawesta û got:

»Peyî...! Çî geliyekî kûr e!«

Bi dengê wî ra Silêman û Miho jî rawestan. Mihoyî got:

»Ji vî geliyî ra dibêjin Geliyê Dojehderê.«

Li dû gotina wî ra Silêmanî got:

»Çî navekî rast û watedar e! Hema rastî jî Geliyê Dojehderê ye. Dojeh

jî qet weha kûr nîne.«

Hersêk tev kenyan. Mihoyî got:

»Gedeno, a... ewên hanê keriyên me ne. Em gereke li pêşîra vî nizarî  
ra

dakevin û herin wî alî geliyî.«

Li ber devê belekiyan belgerêwas û mendê û gûlikê taze serê xwe li  
jêr

axa ter da deranîbûn. Mihoyi got:

»Eva mendêya çû nêriya havînê biseride. Eva mendêya virnî ye.

Rêvasên vira jî çûn berxbirê bigihîjin.«

Tev jor da şiqitîn. Bi dujwarî li serberjêri ra daketin. Giheştin

panavekê. Wî alî geliyî du, sê kerî pez li pêşîra berojî da bijiqîbûn.

Bizorê dikarîn xwe bigirin. Li ser berjêri da dişimitîn. Bi kul û halekî  
xwe gîhandin binê geliyi. Aveke boş li binê geliyi ra bi guj û taw  
berjêr

dibû. Gava ko gihîştin binê geliyi, dengê xurîna avê bera wan li ser  
xwe

da rakêşa. Li milê rastê şurikek bi bilindaya çend gezan bi hurşehurş  
û

hurmehurm jor da dirijiya xwarê û li binê şurikê da av lev digeriya û  
gerînekek çêdikir. Li ser avê ra banz dan. Giheştibûn kuçkê şivanan.

Mihoyi du, sê dangan gazî kir:

66 BILÎCAN

»Xalê Kakil! Xalê Kakil! Nehêle seyên we me bilaw dikin!«

Bi dengê Mihoyi ra sê, çar se, her yek wekî şêrekî ji keriyi qetiyên û  
ber

bi wan hatin. Her seyek jî çengalek li ustuyên wan da bûn. Serê  
şîşikên

çengalan bînanî serê sernêzan li nav pirça katara seqan ra avîtibûn derê.

Mihoyi bi tirs û lerz navên seqan hanî:

»Gurêx., Bigêr, Çalê, Hirço!«

Şivanekî tatikê xwe avît û bi guj li ser berjêri da ber bi seqan hat û li se-

qan hilat. Qafreş pêş da kir ko hucûmî ser seqan bike, lê gava çavên wî bi

gulta wan ket, dêla xwe kire nav lingên xwe û xwe avête ber pesêva Silêmanî. Şivani xwe bi wan ra gîhand. Para ber da seqan. Se bi rewterewt

ber bi çengê keriyê dî çûn.

Mihoyî berî hemûyan got:

»Bereket be xalo!«

Herdu hevalên Mihoyî jî li dû wî ra gotin:

»Bereket be!«

Şivani bersiva hemûyê bi hevra da:

»Ser çavan!«

Mihoyî gotê:

»Xalo! Ehmed Begî ji te û ji sereşivanê pezê istewrî, her yekê ra, dajoyekî

dî jî girtiye.«

Îca destê xwe dirêjî ser Silêmanî kir û got:

»Ev dajoyê te ye, ewê hanê jî dajoyê pezê istewir e.«

Bi gotin û axiftin xwe gîhandin keriyi. Gava gihîştin nava pezî, tarî ketibû erdê.

67

BILÎCAN

7

Hefthezar û heftsed mal li bin siya Eliyê Siwaranî da ne Ew serokê êleke

giran e. Ew êl salê du caran li hilgêr û dagêrê da, li ser hev dadinên.

Salê

du caran weke deriyayê lev dikeve. Pêl vedide. Gava ko êl li ser hev dad-

inên, dibe dema dîtin û vedîtin û serlêdan û dîdaran. Xizm û kes û kar û

heval û hogir û dost û yar li wê demê da dikarin bi sanahî hevdu bibînin.

Nava xîvetan li wan herdu demana da weke bajarekî pir gelhe lê dihat.

Li ber hat û çû û deng û gazî û qûteqûtê, seqan xweyên xwe nas nedikirin.

Komel wisan li ser hev û ber hev ra dihat û diçû, wisan hera û hêvirze çê

dibû, ko bi gotinî hêştir bi barê xwe va û hêştirvan bi darê xwe va li nava

wê hera û hingamê da wenda dibûn.

Her sal li hilgêr û dagêrê da xelkê êlê li ser Mîrî mêvandarî didanîn.

Giregirên êlê her yek têdikoşî, berî yên dî li ser Mîrî û berdevk û pehle-

wanên wî mêvandariyê danên. Mîr her ko da biçûya, pehlewan û berde-

vkên xwe jî bi xwe ra dibir. Êla Eliyê Siwaranî li zozanan da dibû sedan

zomeyên biçûk û mezin. Lê li aranê da çend zome tevî hev dibûn û  
li ser  
gundekî dadinîn. Gelek salan eger zivistan xweş derbas biba û neba  
ba û  
bager û bagera zozanan derbasî wê derê jî nebûya, hema li xêvetan  
da di-  
man. Lê hindêk salan ba û bakurofê kelên ji wan dibirand û ewan  
diketin  
xaniyan û pez û sexel û dewar û pêro û hêştir jî, yan diketin pûtiyê,  
yan jî  
diçûne beroj û axilan.  
Li nav pehlewanên Mîrî da pehlewanak heye. Navê wî Hesê  
Dûdêye.  
Hesê Dûdê pehlewanakî bi nav û deng e. Ew yekî çûrî çeçelî,  
çavhêşîn,  
navmilpan, çarşan, bi zend û bend û bilindbala û bi gevde ye. Ew li  
ser  
rêbaza kal û bavan, li ser rêbaza dapîr û bavpîran maye. Ew li ser  
dînê  
mêjîne Kurdistanê maye. Ew Êzdî ye. Yezdanperest e. Dujminên gel  
û  
welati pêş da Êzdî bi pîlanên cur be cur jêk dûr xistibûn. Piştî wê  
hindê  
ko ewana birbirî kiribûn, ca bi zora şûr ew kiribûn bisulman. Hemîn  
her  
kê neba bisulman jî, kuştina wî gorekî fitaya şêx û melayan helal bû.  
Mela

û miftiyan her li ber xwe da, bêy wê hindê ko li Qurianê da tişteke  
wisan

hatibe, ragehandibûn:

68 BILÎCAN

»Her kesê ko Êzdîyekî bikuje, yê bêy firk û pêş here bihîştê.«

Xelk jî nezan û nexandewar bûn. Çavgirtî wekekoreyan didane dû  
şêx

û melayan û deste deste Kurdên Êzdî, hevxûn û hevvelatîyên xwe,  
xûşk

û birayên xwe bi şûrên dujminan ser jê dikirin. Yan jî bi zorê dikirin  
bisulman. Serekhozên kurd bi fermana şêx û melayan, ko ewaa jî  
her ji bo

malê dunyayê bibûne berdestkên dujminî û ferman û destûr ji  
dewletên

dagîrker verdigirtin, deste deste Êzdî dikuştin.

Herçend ko ewan bi pîlanan Hesê Dûdê jî, ji komela wî tek kiribûn,  
lê

ta roja îro çi kesî, çi serekhoz û şêx û melayî ji xwe ra nedîtibûn,  
bêjin

Hesê Dûdêyî jî, were bibe bisulman. Li şûrweşînî û rimbazî û  
milmilanê

da çi kes nedibû xenîmê Hesê Dûdêyî. Ew pehlewanakî navdar bû.

Nav

û dengê wî belawî çar nîkarên cîhanê bibû. Bi bihîstina navê Hesê  
Dûdêyî ra, gurzî li leşê Pehlewanên derekan ra diçû. Kesî ta roja îro  
newêrîbû rasterast li himber Hesê Dûdêyî da raweste. Hemû weke  
navê

giyanistîni ji navê Hesê Dûdêyî ditirsiyan.  
Ev demanê çend sala ye, ko Hesê Dûdêyî ji komela xwe qetiyaye û  
hatiye ghiştiye Mîr Elî Siwaranî, û wekî pehlewnekî qerah li xizmeta  
wî  
daye. Mîr her kû da here, Hesêyî jî di gel xwe dibe. Çi mêvandarî  
bêy  
Hesêyî naçe serî. Mîr bi hebûna pehlewana kî wekî Hesêyî li ber xwe  
ra  
diçe. Xwe serferaz û bextiyar dibîne. Ya rastî hema Eliyê Siwaranî  
piştî  
Hesê Dûdêyî bibû Eliyê Siwaranî. Bi mêranî û pehlewantiya Hesê  
Dûdêyî bû, ko Eliyê Siwaranî karîbû, xwe li sînoren Ereb û Ecem û  
Romiyên da xudan bike. Êla Mîr Elî Siwaranî weke adeya heft  
deriyayan  
ketibû nîveka sê zilhezên zorbêj. Lê hindî Hesê Dûdêyî bibû  
serokpehle-  
wanê Mîrî, devê dujminan hindêkî ji wan sar bibû. Rast bû, ko Eliyê  
Siwaranî serokhoz û mîr bû, lê nav û dengê wî her nav û dengê Hesê  
Dûdêyî bû. Li her kê derê navê Eliyê Siwaranî dihat, hema reng û  
rûçkê  
Hesê Dûdêyî û mêranî, mêrxasî, pehlewani û camêriya wî di hate ber  
çavên xelkê. Navê Eliyê Siwaranî têkelî navê Hesêyî bibû. Ya rastî  
hema  
herdu nav bibûne navekî. Ji bilî pehlewantiyê, gelek caran Hesê  
Dûdêyî  
Mîrzetiya Mîrî jî fikir. Dema ko mîr Elî Siwaranî bixwesta nameyek  
ji  
Mîrekî bîhanî ra binivîsiya, bi Hesê Dûdêyî dida nivîsandinê. Mîr Elî



Suwaran li jêr kartêkirina bîr û hizrên Hesê Dûdêyî yê kurdîniyê da, gelek caran li himber mîr û serokên neyî kurde hevhesî da, bi kurdîniya

xwe dinazî. Gelek caran gava nameyek ji wan ra dişand, dida Hesê Dûdêyî bi rênivîsa êzdîkî û bi zimanê kurdî dinivîsî. Ewî bi vê yekê dixwest serxwebûn û dewlemendî û zengîniya zimanê Kurdî nîşanî wan

69

BILÎCAN

bide. Her cara ko nameyek kurdî bihata nivîsînê, Mîrî bi dengekî berz û

aza digot:

»Erê da Hesê Dûdêyî rast dibêje, bila xelk û hevhesiyên me bizanin, ko

me jî zimanekî weha şîrîn û zengîn û rênivîseke xoyî heye.«

Melayê Mîrî bi van gotinana pir diêşiya. Lê li bal Hesê Dûdêyî nediwêrî deng bikira. Gava ko serê Hesê Dûdêyî wenda bikira, dest pê dikir,

li dijî wê kiriyara Mîr û Hesêyi ajawegêrî dikir û digot:

»Na, na, bêje Mîrî, ka tu ji xelkê ra bi zimanê kurdî, ew jî pê rênivîsa erebî na, bi rênivîsa êzdîkî naman didî nivîsandinê, kî dikare bixûne!? Te

zimanê Xudê û pêxemberan hêlaye, tu diçî bi zimanê kurdî û rênivîsa çar

malên Êzdiyan, ko ew jî waye li ber kutabûn û rehbiryanêne, dinivîsî.

Xudê kem gunehekî giran e. Bi dîtina min ev yeke kifirî ye, kifirî...«

Mela her tenê li nepenî û pesêvan da, gava ko serê Mîrî û Hesêyi wen-  
da bikira, yan jî li komela Melayan da bû, ko bi tundî dijî rêbaza Êzdiyan  
û rênivîsa wan diaxift. Lê li bal Mîrî û Hesêyi li ser xwe va nedianî.  
Melayek li nav melayan da hebû, digotinê Mela Hesên. Tenê ew dijî bîr  
û raya Mela Ehmedî, melayê Mîrî da bû. Mela Hesênî tim li berevî û kombûnên melayan da bi eşkeretî li dijî bîr û bawerên dijêzdiyane yê  
Mela Ehmedi da diaxift. Ewî digot: »Quran dînê her kesî ra rêz û hurmetê digre. Quran li dijî çî dînî nîne. Tenê Quran dijî bêdînaye. Dijî  
bêxudêya ye. Êzdî xudêhebînin. Ewan Yezdan yanê xudayê tekî tenê di-  
hebînin. Rêbaza wan ya ayînî jî, ji wan ra baş e. Ewan jî wekî hemû mirovên li ser rûbarê cîhanê mafê jiyane hene. Qet Xudê û pêxemberan  
negotine, ko xûna Êzdiyan helal e...«  
He li ser van bîr û bawerên Mela Hesênî bû, ko dîtir melayan ji wî ra digotin Mela Hesênê Êzdî. Hindî Mela Hesênî sûnd dixwar, ko Êzdî nîne, melayan dest jê nedikişandin. Gotegota melayan, ya xwe kiribû. Li  
nav tewawî êlê da ji Mela Hesênî ra digotin: »Mela Hesênê Êzdî.«  
Beda pişka zorereqesofî û hişkebisulmanan ji Mela Heseni dihat. Lê li  
ber Hesê Dûdêyî çî kesî nikarî çep li Mela Heseni binihêriya. Kesî nikarî

tiliya xwe dirêjê Mela Heseni bikira. Hesê Dûdêyî jî hindî ko ev yeka bi-

hîstibû, tim li berevî û komelan da li ber Mela Hesênî va radibû. Ew ji

Mîr û Mela Heseni pêve li ber çî kesî va ranedibû. Ev kiriyara Hesê Dûdêyî jî lap bîr û hizra xelkê li bara wê gotegotê da binecîtir dikir. Hindî

Mela Heseni daxwaz ji Hesêyî dikir, ko li ber va ranebe, Hesêyî nedipeji-rand.

Welatê li jêr destê Mîr Elî Siwaranî da bi saya serê Hesê Dûdêyî roj bi

70 BILÎCAN

rojê deng vedida. Hesê Dûdê ew pehlewane zorî zorbe, ew mêrxasê nav-

dar çendîn caran bi pehlewane neyaran ra, ko hatibûn hêrişî ser av û axa

wan kiribûn û daxwaza bac û bêşan li wan kiribûn, guleş kiribû. Çendik

û çend pehlewane bîhaniyan bi destê wî, bi nêza wî, bi şûr û tîr û xencera wî, bi zerga wî ya xezebê ber bi dojhê şa bibûn. Ewî çend pehle-

wane romiyan li ser çokan xistibû. Li ber nav û dengê Hesê Dûdêyî roj

bi rojê li desthelatdariya Mîr Elî Siwaranî zêde û zêdetir dibû. Roj bi ro-

jê kewşenê Aran û Zozanên wî, sînorê welatê wî berfiretir dibû.  
Evan  
hemû li saya serê Hesê Dûdêyî da bûn. Hesê Dûdêyî jî çî bigota Mîrî  
bêdiliya wî nedikir. Li ser daxwaza Hesê Dûdêyî Mîrî xwendebêjekî  
Êzdî  
anîbû. Zaroyên çend malên Êzdiyan ko li zoma Mîrî da bûn, li bal wî  
xwendebêjê Êzdî, bi zimanê kurdî û bi rênîvîsa êzdîkî xwende  
dixwendin. Hesê Dûdêyî jî her gava ko serê wî ji kar û barên dîwanê  
û şer  
û şûrên dujminan vala biba, diçû alî xwendebêjê xwe û li Mishefa  
reş ji  
zarokan ra bi dengê bilind gotinên ayînî vedixwend û ji wan ra ji  
dîwana Şêx Adê bi deng û miqam helbestên ayînî dixwendin.  
Herwisan  
Hesê Dûdêyî heftiyê carekê jî bernama guleşanê danîbû. Ewî  
heftiyê  
carekê tewawî zaroyên zomê, genc û law û qîz û xort berev dikir û  
ewana  
fêrî fend û fêlên pehlewantî, şûrweşînî û nêzebazyê dikir.  
Lê li himber wî da Mela Ehmedi jî xwendexaneyê mezîna vekiribû.  
Pişka zore zaroyên zomê diçûne bal wî û bi zimanê erebî dixwendin.  
Heft kur û qîzeke Hesê Dûdêyî heye. Ewî ew heft kur û qîza xwe fêrî  
her cure fend û fêlên pehlewantiyê kiriye. A, Gîha li ser rehên xwe  
şîn  
dibe. Têjikên maran bê jahr nabin. Tewawî zaroyên Hesê Dûdêyî jî  
wekî  
wî pehewan in. Hemû gir û beranîne. Li nav koma heval û  
hevtemenan

da dûr va dihêne xûyanê. Hemêşe bihostekê li ser hevalan dikevin.

Kiça

Hesê Dûdêyî çarimîn biçûka malê ye. Navê wê Werdek e. Lê bi şîrînê dibêjinê Werdê. Rastî jî hema Werdê bînanî Werdekekê ciwan û wekî

qazekê binaz û wekî eluhekê jîr û jêhatî, tîjçeng û zîx e. Hind ciwan e,

nazê li erd û esmanan dike.. Dibêje tavê tu dernekeve, ezê derkevim.

Rûmetê wê yê soresipî parava tê xûyanê. Bejina wê bilind, sîngê wê bi ber

û navtenga wê zirav e . Çavên wê şîn, tu dibêjî cotek oqyanosin.

Bijangên

reş û birûyên kêşayî bînanî perên reşdalaşan diteyisin. Biskên wê yê ba-

dayî dirijin ser navqeda zirav. Gerdena wê bînanî gerdena sîh û qazan

bilind û mermerîn e. Dema ko bi rêve diçe, weke mahîneke dêlgirêdayî

girmegirm li binê piyên wê tê. Yeke bi zend û bend û tevkutayî û tevba-

dayî ye.

71

BILÎCAN

Çi kesî nikarî xwe li ber ciwanî û bedewetiya wê ragirta. Ewê dilê gelean kiribû av. Werdê jî weke bav û her heft birayên xwe pehlewan e.

Li ber destê bavê xwe hîmî her cure fend û fêlên pehlewantiyê bûye.

Li nav êla Mîr Elî Siwaranî da debe, ko mehê carekê genc û law û xurtên pêragiheştî, li meydana zoranê da berev dibin û milmilanê dikan.

Li wê rojê da giştî xelkê êlê derdikevin temaşa zoranbazan. Mîr bixwe bi

giregire û ridênsipî û berdevk û pehlewaniyên xwe va li rêza pêşîn li ser

rûniştekan kevirîn rûdinên û li zoranbazan û çawaniya milmilanêya wan

dinihêrîn. Li nav wan zoranbazana da, kê bibe berinde, ji layê Mîrî va tê

xelat kirinê.

Eve sê, çar salin, ko Werdê jî ketiye nav gera milmilanê da. Ewê pêş da

li gel kiçikan milmilanê dikir. Lê ewê giştî kiçikên êlê li milmilanê da şikandibû. Êdî li nav kiçikên êlê da çi kiçekê ji xwe ra nedidît, di gel Werdê milmilanê bike. Li ber wê hindê bû, ko Werdê ketibû nav gera

kurikan da. Ewê pêş da bi birayên xwe ra milmilanê dikir. Ewê her sê bi-

rayên xwe yê mezî jî li meydana zoranê da li pêş çavên giştî temaşe-

vanan da li erdê dabû. Piştî hînga li ser daxwaza bavê xwe û Mîrî bi xortên

dî ra ketibû zoranbaziye. Ewê ew xortana jî işkandibûn; berebere Werdê

navê pehlewantiyê girtibû. Hemûyan digotinê Werda pehewan.  
Êdî  
wisan lê hat, ko çî pehewan û zorbeyên êlê jî ji xwe ra nedidîtin, ko  
bi  
Werdê ra milmilanê bikin. Nav û dengê pehlewantiya Werdê li çar  
nikarê Kurdistanê ra derbasî welatên dereke jî bibû. Nav û dengê  
wê li  
ber guçkên pehewanên rom û ereb û eceman ketibû. Ewî navî her  
yek li  
xwazîkekê da şewitandibû. Navê Werdekê bibû pirzika li ser zimanê  
xas  
û nasan. Werdê bibû xewin û xiyala pehewanan. Êla Mîr Elî  
Siwaranî  
cînva bi serê Werdekê sûnd dixwarin.  
Erê, Werdekê xewa gelek genc û xortên Mîr û began herimandibû.  
Gelek pehewan li hejîk û evîna Werdekê da dişewitîn. Li her alî ji  
malên  
giregire û mîr û beg û şah û padişahan ra dihatin mala Hesê Dûdêyî  
xwazginiyê Werdekê. Lê Werdekê mercek danî ye. Ewê gotiye, her  
kesê  
ko bikaribe li milmilanê da piştta wê li erdê bidê, dê wî ya bike. Lê  
eger ke-  
sek bi mebesta zewacê di gel wê milmilanê bike û neşê wê li erdê  
bide, dê  
li ber çavên hemû temaşevanan da bête siza danê. Sizaya ewê  
torandî jî  
ewe, ko dê li pêş çavên giştî temaşevanan da, kulîmekên wî dax  
bikin.

Ta roja îro gelek kulîmek li ser Werdê hatibûn dax kirinê. Gelek dil  
jî  
ji bona Werdê bibûne patîlok, lê newêrîbûn li wê bareyê da devê  
xwe jî  
vekin. Evîna Werdekê li dilê wan da bibû derd û kul.

## 72 BILÎCAN

Werdekê pê kutaye bîst saliyê. Ta roja îro li her alî gelek kesên bi  
nav û  
deng hatine xwazginiyê Werdekê û xwestine wê bêy merc, lê bi  
barên zêr  
û zîvan bikin bermaliya mala xwe. Bikin bûka xwe. Lê Werdek  
kiçkiçanî  
li ser gotina xwe rawesta ye. Ewê destê xwe li sîngê xwe dida û  
digot:  
»Ez ne ew qîza me ko ji bona malê cîhanê, li ser gotina xwe bizivirim.  
Ezê heta hetanî li ser gifta xwe rawestim. Ez ne ew qîza me ko ji bo  
malê  
cîhanê bixapim û ji mercê xwe çavpoşiyê bikim.«  
Gelek pîrejî û porsipiyan bi destekê ew tek dikirin û digotinê:  
»Kiçê! Were li kerê decali peya be! Kiça min mercê te pir giran e. Ka  
ew  
pehlewane ko bikaribe pişta te li erdê bide. Yezdan kem, tu yê hema  
wisan qîz bimînî. Heyfa te canika ciwan nîne, tu van zend û  
bendane,  
van çavên şîn ko tu dibêjî deryaya bêbine, çima bêçine pûç dikî?!  
Were  
xwesta kurê filan mîrî, yan filan padişahî bipejirîne...«



Lê her gava ko Werdekê gotin û bispartineke weha ji devê jinekê, ji de-  
vê destekekê bibihîsta, ew jin yan ew desteke bê avirû dikir. Wisan lê  
dikir ko seqan nan ji destên wan nedigirtin. Li bersiva wan da digot:  
»Ez ne ew kiça me, ko bona zêr û zîv û malê cîhanê nav û deng û  
averûya xwe bidim bayê. Ezê heta hetayî li ser gifta xwe rawestim.«  
Bavê wê Hesê Dûdêyî jî qet quretiya dilê kiça xwe nedişkand. Her kî  
bihata xwazginiyê Werdekê, digotê:  
»Ez qet nikarim mercê kiça xwe bişkênim. Kiça min serbest e.«  
Ya rastî qet dilê Hesê Dûdêyî jî nedixwest, ko keça wî, pehlewana  
wî li  
nav koma pehlewanên wî da derkeve û here têkeve bin lepên xelkê.  
Yek ji wan ên ko evîna Werdekê dil û cergên wî peritandibû, lê ji  
daxa  
kulîmekê ditirisiya, Ehmed Begê kurê Mîr Elî Siwaranî, bû. Dilê wî li  
evîna Werdekê da bibû patîlok. Lê ji tirsax daxa kulîmekê nediwêrî  
ew  
raza xwe li bal çî kesî servekira. Ew li evîna çavên Werdê yên şîn û  
bejin  
û bala wê ya bilind û li hemûyê giringtir li evîna pehlewantiya  
Werdekê  
da dişewitî. Dilê wî li ber agirê vê evîna malçol da bibû kizik. Şev û  
roj  
hewk û aram jê hatibû birînê. Ewî bona wê hindê ko çavên wî zû bi  
zû li  
Werdekê bikeve, gera milmilanêya genc û lawan li mehê carekê  
kiribû

mehê du caran. Herdu heftiyan carekê bixwe li ser rênçberan ra radiwes-

ta, meydana zoranê bi wan dida paqij kirinê û gera zoranê digerland.

Li

roja zoranê da ew her tim li rêza pêşîn rûdinişt û çavên xwe dikuta nîve-

ka meydanê. Gelek caran jî li milmilanêya bi merc da, gava ko xwazginiyekî bitoranda, bixwe li ser serê celadan ra radiwesta û xwazginiyê torandî dida dax kirinê. Ewî dixwest bi vê hindê xwe li dilê

73

BILÎCAN

Werdekê da cî bike. Lê Werdeka malava qet avirekî sar jî nedidayê.

Qet

ji derman ra jî dîna xwe nedida wî.

Hindek caran avirekî sar, lênihêrîneke tevizî û bi xeşim, heylo du-  
jûneke tund jî daxa dilê mirovî daxa dilê dilketiyan sar dike. Gelek  
caran

bihîstina dujûneke tund û qilêrîn, ji layê dilberan bo dilketiyan  
derman

e. Ehmed Beg hema li xwazîka avirekî tund û dujûneke qilêrîn da jî  
dis-

ot. Lê Werdek xatûnê qet ew li ber çî tiştî nedihejmart. A, evê hindê  
lap

agir bi dil û hinavên Ehmed Begî dida û evîneke tevî kînê li dilê wî  
da cî

dikir. Evîna tevî kînê pir dujwar e. Evîndarê derdgiran ne ewe ko dest ji evîna xwe bikişîne, ne jî ewe ko dijî evîna xwe bilive. Destê wî ji guliyên daran qetiya ye. Erê dilê Ehmed Beg yê birîndar, a li vê evînê da diaviya û dibihuşt. Berebere evîna serneketî cîhê xwe dida kerb û kînê.

## 74 BILÎCAN

8

Silêmanî gelek caran dema ko diçû zomê ciriya şivanan bîne, milmilanêya Werdekê û pehlewana bi çav didît. Gelek caran li çawaniya guleşgirtina wê hûr dibû. Êdî ew baş li ser fend û fêlên guleşanêya wê ketibû. Dizanî ew çawa xenîmên xwe li erdê dide. Herwisan gelek caran daxkirina kulîmekên pehlewana torandî jî bi çav dîtibû. Her dema ko li vê barê da dihizirî, gurzî li leşê wî ra diçûn. Wî zor caran xwe çirçirandi-na pehlewana, dest û pê kutana wan li jêr daxê da dîtibû. Dema ko rewşa pehlewana şikestxwarî, ew jî ji destê kiçekê, li jêr daxê da dihanî ber çavên xwe, mûyên leşê wî dibûn şûjin û derzî. Pirça serê wî ji kolozê wî ra diavîte derva. Ew pehlewana ko nav û dengê wî û mêraniya wî

belawî cîhanê bibû, weke berxekî bixwe pê piyên xwe dihate ber  
kêra  
bikojan. Digotin, gelek ji wan pehlewana piştî daxê biçûn. Kêm  
pehlewaneke, ew jî pehlewaneke bêşerm û fedî, pehlewaneke bêar û  
fehêt  
piştî daxê zindî dima.  
Zor dujwar e, gelekê sext e, mêrek bi destê kiçekê bête dax kirinê.  
Ew jî  
mêrê ko bi nav û deng be. Pehlewan be. Li meydana şeri da mêr û  
pehle-  
wan kuştibe. Talan vergeran dibe. Bac û bêş bi zora şûrê xwe li  
neyaran  
stan dibe. Şikesta mêrekê weha ji destê kiçekê, her çend pehlewan  
be jî,  
pir dujware. Mirina wî mêrê ji mayîna wî gelekê çêtir e. Mirin ji wî ra  
ji  
zêrên zer jî çêtir e. Bila bimre, qet nemîne. Evana hemû gotinên  
xelkê  
bûn. Ew mêra ew pehlewana eger li bin daxê da derkeve û cergê wî  
ker  
nebe jî, êdî rûmeta wî, avirûya wî, sengî û giraniya wî li nav komelê  
da  
namîne. Êdî li ber şerman neşê rû li gel û komelê bikeve. Ber şerman  
nikare li mal derkeve. Li siya xwe disilike. Li siya xwe şerm dike.  
Şermê ji  
navê xwe û hebûna xwe dike. Li ber şerman nikare li nav çavên kes  
û kar

û xizm û dost û nasên xwe jî binêre. Êdî ew bûye serhevda serê mala  
xwe,  
malbata xwe, xêl û eşîreta xwe. Ne tenê ew bêavirû bûye, belkû  
malbata  
wî, kes û kar û xînamî û dost û yar û xêl û eşîreta wî jî bêavirû bûne.  
Li ber vê hindê bû, ko pişka zore pehlewanên ko dihatin dax kirinê,  
li  
ber şerm û kerban bicîbûn. Li ber şerman ji mal derneketibûn. Li  
bin  
75  
BILÎCAN

siyê da mabûn. Li bin siyê da zer û zerhimî bibûn û miribûn. Yan jî  
hema  
li yekimîn şeva şikestê da, xwe kuştibûn. Xwe li ser şûrê xwe da  
avîtibûn  
û şûrê wan li pişta wan ra derketibû. Xwe darda kiribûn. Xwe li ser  
nêza  
xwe da avîtibûn û nêzê li navmilê wan ra hilavîtibû. Çunkî dizanîn  
ser-  
hevda serê gelê xwe ne. Dizanîn ko mirina wan ji mayîna wan baştir  
e.  
Taze piştî mirina wan jî ew nava li ser malbat û xêl û eşîret û welatê  
wan  
ranedibû. Navê malbata wan, navê xêl û eşîret û gel û welatê wan  
dibû,  
xêla qûnbidaxan.

Silêman li van bîr û hizrana da cûm bibû. Xwe jî yêk ji wan pehlewanan

dizanî. Xwe ji xwe ra dihizirî û digot:

»De kanê çi lê tê? He çi li ser eniya mirovî hatibe nivîsînê, ewê bê serê

mirovî. Ez ko nizanim ka çi li ser eniya min hatiye nivîsînê. Ez ko ser-nivîsa xwe nizanim. Diqewime heye ez jî yêk ji wan bim, yên ko li jêr daxê da can didin.«

Lê berewajî van bîr û hizrana bejin û bala Werdê, rewta wê û pehle-wantiya wê, çavên wê yên şîn, qet çi caran li pêş çavên Silêmanî nediçûn.

Ji wê hindê pêve ko Silêmanî gelek caran Werdek li meydana zoranê da

dîtibû, pir caran ew di gel qîz û bûkên zomê jî, kuliyan hiriyê li zendan

dihatin bêriyê. Gava ko bêrivan dihatin bêriyê, Werdek jî wekî por-sipiyekê li ser wan ra radiwesta û ferman dida wan. Hînga lap Silêmanî

dikarî ewê li nêzîkva bibîne û evîna wê li nav peroka dilê kul da binitilîne.

Taze nîne, mêjve ye, ko Silêmanî Werdê bi çavan dîtî ye û bi dil û canan evandiyê. Mêjveye, ko kevotka evîna Werdekê li kûraniya dilê

Silêmanî da hêlûn daniye. Mêjve ye, ko Silêman bûye evîndarekî dil-birîn.

Ev du salên xiştin, ko Silêman li ber pezê Mîr Elî Siwaraniye. Kêmtir ji

du salan jî nîne ko evînê dilê wî peritandiye. Kêmtir ji du salan nîne ko  
tîra evîna Werdekê dilê wî yê kul hingavtiye. Lê ji wî pêve ta roja îro  
çi kes  
bi wê raza nehînê û sergirtî nehesiya ye. Ew nawêre ewê raza xwe li  
bal çi  
kesî serveke.

Silêman niha bûye sereşivanê mihiyan. Ca niha bilûrekê lêdide, ko  
dengê bilûra wî li mejiyê hestikên mirovan da kar dike. Dengê bilûra  
wî  
dilê keviran nerm dike. Nêriyê xoyîdayî li ser avê verdigerîne.  
Mehekî, dûyan berî niha revdeyek gur bi keriyê Silêmanî hewilîbûn.  
Lê

Qafreşi her li şeva yêkê da gurekî mezin, angorî cendekê kerekî  
xendiqandibû. Îca Silêmanî pez bi hîviya dajoyan va hêlabû. Nêriyek  
ser-  
jêkiribû. Kiribû qurban. Cendekê nêriyi avîtibû ser piştta guhdirêja  
şi-

## 76 BILÎCAN

vanî. Cendekê gurgi jî danîbû rex û Qafreş dabû dû xwe û çûbû nava  
zomê. Gava ko xelkê zomê pê hesiyabûn, hûr û gir hemû hatibûn  
pêşe-  
waza Silêmanî. Mîrî kurkê xwe yê Hezoyî ji milê xwe şiqitandibû û  
avîtibû milê Silêmanî. Werdekê jî bixwe bi destên xwe ji Qafreşi ra  
hevrîşk çêkiribû û danîbû ber Qafreşi. Mîrî zengilekî zeng, zengilê  
nêriyan bi destên xwe kiribû ustuyê Qafreşi da. Hînga bû ko  
Werdekê li

nava qîz û bûkan da, li ber çavên hemûyan ji Silêmanî xwestibû,  
bonetî  
gurêxiya Qafreşi demekê ji wan ra li bilûrê bide. Ca Silêmanî jî kelên  
ji  
dest xwe dervedabû. Li derfendê wec wergirtibû, qiliftîva bi  
miqamê,  
Qaz Werdeka gola kûrîn li bilûrê dabû. Werdekê ta kutayê  
guhdariya  
bilûra Silêmanî kiribû, û pir keyfxweş bibû.  
Silêmanî ew dîmena anî ber çavên xwe. Xwe ji xwe ra got:  
»Gelo ma nabe, ko bilûrê dilê wê nerm kiribe?«  
Silêmanî nikarîbû raza dilê xwe servekira. Eger ew raza servekira,  
yê li  
nava êlê da biba polekî bi du peran. Qet ne tenê Werdekê û bav û  
birayên  
wê, ev yeka nedipejirandin, belkû xelkê jî qet nedipejirandin. Xelkê  
yê  
bigotana; Darik û dêre?! Hirç û gêre?! Hêştir û leblebî?! Reqe û  
xelîlî?!  
Ruvî û şaristan?! Gurg û eywan?! Şivan û dîwan?! Werdê û  
Silêman?!  
Her cure bîr û hizran xwe li serê wî didan. Van rojana lap bêhewuk  
bûye. Bînanî tiştê ko dabe serê wî. Hema bixwe ji xwe ra xeber dide.  
Taze danê bêriyê dest pê bibû. Qîz û bûk hemû rojê berî  
germegerma  
nîvro satil û kodik û meşkên xwe dadinîne ser piştta guhdirêjan û bi  
xwe



jî her yekê kuliyeke hiriya mihiyan li zendên xwe dialandin û teşiyên  
xwe  
didane destên xwe û dihatin bêriyê. Gelek rojan Werdek jî bi wan  
ra di-  
hat. Rojek ji rojên kutaya meha gulanê bû. Der û deşt li kulîlkên ren-  
gareng da diçilvilîn. Taze ewe heftiyek bû, ko guran Qafreşê Silêmanî  
xendiqandibûn. De pêşiyar gotine: Cerê avê, dê di riya da bişkê  
Qafreşê  
gurêx jî ko li dirêjaya mehekî duyan da çendîn gurg xendiqandibûn  
û ji  
layê Mîrî ve hatibû xelatkirinê, ew jî şevê kete gîra gurgan û bi  
dev û  
lekmên gurgan hate pirozekirinê.  
Silêman hê ji şîna Qafreşî kuta nebibû. Ewî xwe dabû ser kevirekî  
pêşberî bêriyê û bilûra xwe dabû ser lêva xwe û bi miqamekî şewat  
ditûrande bilûrê. Durust li wê demê da bû, ko dîsan qîz û bûkên  
zomê  
weke her car teşiyên wan li destên wan da, bi ken û henek ber bi  
bêriyê  
dihatin. Her yekê çepikeke gulsosinan jî li rex kaniya serê rê çinîbûn  
û li  
ber serê xwe ra li ber girdêlên xwe ra kiribûn. Digotin û dikeniyar û  
ber  
bi bêriyê dihatin. Gava ko nêzîkî bi keriyî kirin, Silêmanî dît ko  
Werdek

77

BILÎCAN

jî waye bi wan ra ye. Silêman ew miqamê şewat guhest û dest pê kir, dîsan  
heman miqamê »Qaz Werdeka gola kûrîn« lêda. Ta ko koma zeriyan  
pêra giheştin jî, ewî hema wisan li bilûrê dida.  
Kerî ber bi mexel hat. Bêrîvanan jî teşî û kuliye xwe danîn û satil û kodikên xwe hildan û daketin nava mihiyan û xerîkî dotinê bûn. Werdek  
jî weke porsipiyekê li ser wan ra rawestayê û hem teşiyê dirîse, hem jî fer-  
manê dide wan. Lê Silêman hê jî li ser kevirê pêşberî bêriyê peya nebûye  
û bi gef û gur û bi dilekî birîn û dengê bilind li bilûrê dide. Mirovî peyv  
bi peyvên istiranê ji miqama bilûrê ra têdigihîşt, ko digot:  
Qaz Werdeka gola kûrîn  
Qaz Werdeka gola kûrîn  
Te mêrkoja tipil bi xwîn  
Çavhêşîna mêrxas bizdîn  
Pehlewana kember zêrîn  
Bavêzdîka Yezdanhebîn  
Kurdîbêja ezman şîrîn  
Cergê min sot dil kir birîn  
Cergê min sot dil kir birîn  
Dilkê kul kir cîkê evîn  
Qaz Werdeka gola kûrîn...  
Werdê soromoro bibû. Ew êdî lap bi nêta dilê wî hesiyabû. Êdî raza dilê

Silêmanî bi wî miqamî li bal wê eşkere bibû. Bi hêrs li ser Silêmanî da

setem kir û gotê:

»Tûretûra bilûra te serê me bir. Çî ye tu wekî kundekî li ser keviri rûniştîyî, tu nayê alî bêrîvanan? Were alî van!. Were bigre serê bizinan,

bila bêrîvan zû kuta bikin.«

Lê Silêmanî du, sê carên dî jî li heman wî miqamî zivirîbû. Êdî dabû serê Silêmanî. Deriyaya evînê hatibû coşê. Kel diçû. Fûrvedida û li ser ra

diavît. Êdî Silêmanî nikarî berayîka xwe bigirta.

Li ser kevîrê ko lê rûniştibû, rabû. Xwe dakuta. Bilûra xwe li ber pişta xwe ra kir. Dakete nav pezî û ber bi bêrîvanan çû. Gava ko gihîşte bal

bêrîvanan, bi milê bêrîvanekê ra girt û ew tek kir û bû pistepista wî tişte

li guçkê wê da got. Bêrîvan wehimî. Zendegirtî ma. Sist bû. Milê wê kete

ber da. Li Silêmanî qetiya û tirsetirs ber bi Werdekê çû. Bi wê rewşê ra

bêrîvanên dî jî seha tişte

78 BILÎCAN

û ber bi Werdekê çûn. Hemû li ser hev da quricîn. Ewê bêrîvan ko Slêmani pê ra xeberdabû, gote Werdekê: »Sereşivan dibêje, bêje xatûna

xwe bila min bike. Eger napejirîne bila were em guleşanê bikin. Eger  
kiça  
babê xweye, bila li ser mercê xwe raweste.«  
Werdê soromoro bû û got:  
»Çi nake kulîmekên wî jî daxan dixwazin.«  
Bi vê gotina xwe ra gazî kir:  
»Lolo sereşivano! Dibêje qey tu jî serê xwe li kendalan didî. We  
diyar e  
ko kulîmekên te jî daxan dixwazin. Xwe teyar ke, were meydanê. Ez  
li ser  
gotina xwe me.«  
Îca Werdê teşî û kuliyan xwe danî erdê. Guhar û gerdenî û  
bercênîkên  
xwe vekir. Gustîl û bazin û tetikên xwe deranî. Xemla xwe şêland û  
xişlê  
xwe şiqitand. Şûtika xwe girêda û xwe qîşt kir û dakete meydanê.  
Silêmanî jî tatikê xwe yê şivaniyê danî erdê. Kewanê xwe ji milê xwe  
jorda anî. Tîrdanka xwe ji milê xwe vekir. Xencera xwe li ber pişta  
xwe  
deranî. Pişta xwe şidand. Xwe amade kir û qîşt û qivrax dakete  
meydanê.  
Bêrîvan û şivanan jî dest ji her karî kêşan û bi sosret û zendemayî  
çît  
girtin, dîna xwe dane herdu pehlewanan.  
Herdu pehlewan bi gef û gur daketin meydanê. Dest li navtenga  
hev-  
du ra şe kirin û hevdu birin û anîn. Hevdu hevraz û berjêr kirkaş  
kirin.

Gava ko taze destên wan gihîşte hev, dilê Silêmanî weke tifka asinkeran dikuta. Hema hindik mabû li destpêkê da xwe bi destê Werdekê va ber-  
da. Dilê wî ji tirsan nedilerizî, belkû ew lerz, lerza evînê bû. Hindik mabû ko bêhna wî bigre. Lê Silêmanî xwe berev kir û dilê xwe kire jêr desthe-  
latdariya hişê xwe da. Taze kerî hatibû bêriyê. Taze tav şirîn bibû, ko herdukan bi hev girtin. Zоргivişk dane hev. Dewsa piyên wan weke dewsa kotanên werzigarên deşta Geverê, erdê bêriyê tîş tîşî dikirin. Erdê mexel li ber piyên wan hate cot kirinê. Bû nîvro. Tav hate raserî serê wan. Lê hê jî hema wisan yek-  
bêhin hevdu hevraz û berjêr kirkaş dikirin. Zor didane hevdu. Hevdu pal didan. Navlinganî davîtin ber piyên hevdu. Hingê kelan û nixdên gamêşan didane hevdu. Taw li piştê hevdu dixistin. Sebeta sîngên hevdu bi gişt hêz û şiyânê xwe va digivaştin. Qirpeqirpa pişt û pîlên wan bû. Helkehelk bi herduyan jî ketibû. Dajoyan dil didane ber dilê sereşivanê xwe. Bêrîvanan jî han didane xatûna xwe:

»Werdê ha Werdê! Werdê ha Werdê! Ha şepala bêheval! Ha şêra sor!

79

BILÎCAN

Hay hay! Şêr şêr e, çi jine çi mêre. Werdê xwe bidê! Kiçê hindik maye.

Xûyê li ser ra avîtiye. Qûna wî jî daxan dixwaze. De dayîka me Werdê.

De Werdeka gola şîn! Dey xûşka heft birayan. Dey dey, pehlewana Yezdanhebîn! »

Dema ko Silêmanî navê daxê bihîst, cîhan li pêş çavên wî reş û tarî bû.

Xwe berev kir û li vî serê meydanê ta serê hanê Werdek kire kirkaşê da.

Di gel vê rewşê şivanan bi hev ra navê Silêmanî anîn:

»Silêman ha Silêman ! Ha şêrê sorî navmilpan! Hema hindik maye ha!

Te baş navteng jê standiye! Derfendê nedê! Zorgivişkan bidê! Silêman ha

Silêman! Şêrê sorî navmilpan!..«

Vê carê Werdekê zorgivişkek da Silêmanî û li wî serê meydanê ko Silêmanî ew pal dabû, bi paldan û berxwedan Silêman paşopaşo ta naverasta meydanê pal da.

Bêrîvanan dîsan kirin gazî:

»Ha Werdeka gola şîn! Ha şepala çeng bi xwîn! Kiçê daxikan sor bikin!

Hindik maye. Ezê bixwe pê destên xwe qûnka wî dax bikim. Qûna  
te

daxan dixwaze kereşivano!..«

Bi bihîstina navê daxê ra xûna Silêmanî hate coşê. Hindî zor û şiyana  
li

leşê wî da hebû, xwe dayê. Dîsan Werdek kire kirkaşê. Dîsan ew li  
serê

meydanê ber bi binê meydanê pal da. Lingekî Werdekê li ber fistiqî.  
Werdek kûşkê xwaromaro bû. Lê bi dengê bêrîvanan ra xwe rast  
kir. Xwe

kire binçengê Silêmanî û ew lev pêça. Hindik mabû ko Silêmanî li  
ser

taqa piştê li erdê bide, lê Silêmanî derfend nedayê û navlinganî  
avîte ber

lingê wê û li nîveka meydanê da ew werpêça û li ser taqa piştê li  
erdê da.

Qîjîn bi bêrîvanan û qûtîn bi şivanan ket:

»Hay Silêmanî Werdê li erdê da. Hay Silêmanî Werdê danî erdê...«

Şivanan gazî berxvanan kirin. Bexvanan gazî golikvan û gavana kirin.  
Gavanan revîvan û kelevan û hêştirvan pê hesandin. Hêştirvanan  
gazî

pale û pincarçinan kirin. Pale û pincarçinan malîvan pê agadar kirin.  
Ev hawariya bînanî birûskê belayî axaran bû û berî zivirîna  
bêrîvanan

gihîşte nava êlê. Hesê Dûdê bibû pilingekî dev bi xûn. Tûre bibû.  
Wekî

nerekî hêçbûyî kef li ser devî ketibû. Li ber hêrsan simbêlê xwe  
dicût.

Lêva xwe dikot. Ewî destê çendik û çend pehlewan û mîr û beg û şah û padişahan paş da zivirandibû. Îca niha gereke destê kiça xwe, destê wê pehlewana xwe ya navdar, ko bi dehan pehlewan bi destê wê şkestibûn, dehan pehlewan bi destê wê bi fermana wê hatibûn dax kirinê, bigre û têke nav destên şivanekî. Ew jî şivanekî bêkes û kar. Şivanekî ne ji êlê û

80 BILÎCAN

ne ji eşîrê. Qet kesî nizanî ka kurê kê ye û ji kû hatiye. Eva ji Hesê Dûdêyî ra şermeke mezin û serşoriyeke giran bû. Ewî êdî nikarî serê xwe li nav dost û dujminan da bilind bikira. Jê ra neng bû, neng. Gava ko li nav êlê da bû dengî û gotin: »Îro hema li nav keriyi da, Werdekê û Silêmanî bi hev ra milmilanê kirine û Silêmanî Werdek li erdê daye...«

Her heft birayên Werdê, heylo birayê wê yê şeş heft salî jî xwe li çek û rihelên şeri da tev girêdabûn û gotibûn:

»Em napejirînin. Emê serê Silêmanî bifirînin. Emê wî şivanê bêkes û kar bikin xwerê eluh û dalaşan. Emê porê Werdekê kur bikin. Emê wana herduyan jî hincîhincî bikin. Em vê milmilanêya li nepenî da napejirînin...«



Bi bihîstina vê hawariyê ra hêvirze ketibû nava êlê. Şîn li ser mala Hesê

Dûdêyî da hatibû. Xelkê êlê her yekê tiştê digotin. Hindik şa dibûn û

dikenyan. Hindik jî posîde û xemgîn bûn.

Serê êvarê bû. Tavê xwe dabû serê çiyayên rojava, ko Werdek daketî,

poraloz, posîde, bi şêl û şepêl, hevderketî, bi lêv û loper, daliqayî daliqayî bi koma bêrîvanan va gihîşte zomê. Jin û zar û pîr û kal hemû

derketibûn ber devê xîvetan û li wan dinihêrîn. Hesê Dûdêyî li cil û bergên pehlewantiyê da, li çek û rihelên şêri da, bînanî şêrekî birîndar

xwe pêşiya bêrîvanan ra gîhand. Bi dengê tûre û lerizok li Werdekê

pirsî:

»Kîçê ya ko min bihîstiye, rast e!?«

Werdê serê wê li ber da, porên wê rijiyayî li nav çavan, bêy hemdê xwe,

li nava dev û lêvan da, wisan ko bîzorê dihate seh kirinê, got: »Erê.«

— Hey kîça min ! Te li kutaya temenê min da ez kirim hevalê şivanekî.

Te li kutaya temenê min da ez bednav kirim.«

Werdê serê xwe kiribû ber xwe û nedixift.

Hesê Dûdêyî li ser da qûriya û gotê:

»Ez napejirînim. Ez kîça xwe nadim şivanekî.«

Bi dengê wî ra çend mêr li xîveta Mîrî derketin û hatin bi milê wî ra girtin û ew ber bi dîwanxanê birin.

Werdê jî bi serê daketî û bi şêl û şepêl ber bi mal çû. Dayîka wê hat  
û bi

milê wê ra girt û ew bire hundurê konî.

Ridênsipiyan Hesê birin hundurê dîwanxanê. Mîr li naverasta  
dîwanx-

anê da li ser doşekeke mexmerî bi palgî û berpâl rûniştibû. Tevran  
sim-

bêlên wî nedibirîn. Lamên wî dibiriqîn çavên wî dikeniyên. Li ber  
şabû-

81

BILÎCAN

na sêveke sor nediçû devê Mîrî.

Gava ko Hesê Dûdê dakete hundurê dîwanxanê, Mîr li ber va  
hilqed-

imî û ciyê rûniştinê nîşanî wî da. Bi rûniştina Hesêyi ra, weke her car  
qawegerînan qaweyek danîne ber Hesêyi. Mîrî ciyê xwe xweş kir û  
du, sê

caran bi destê xwe yê rastê xaba mexmerê doşka xwe tûmar kir û  
berê xwe

li ser Hesêyi da kir û bi dengê aram pirsî:

»Hero Hesê ew gotegota rast e?«

Hesê li wê demê da ko serê wî li ber da dernediket, bersiv da û got:

»Erê rast e. Lê ez napejirînim«

Dîwanxane li bêdengiyê sosret da cûm bibû. Bo qaseke xurt deng  
ji

çi kesî derneket. Heylo qawegerînan jî dest ji karê xwe kêşabûn.

Paşî de-

meke xurt Mîrî bêdengiya dîwanxanê şkand û dîsan berê xwe li ser Hesêyi da kir û pirsî:

»Tu ji vê qewimînê ra çi dibêjî Hesê ?«

— Ez napejirînim.

— Tu çawa napejirînî? Eva mercê kiça te ye.

— Ez ewê milmilanêya li nepenî da napejirînim.

— Hesê şivan û bêrîvan hemû gowan in. Ew milmilanêya li roja ron û

li ber çavên komeke mirovan da hatiye kirinê.

— Ez napejirînim Mîr. Ezê çawa rabim destê kiça xwe ra bigirim û têkim nav destên şivanekî bêkes û karî ne ji êlê û ne ji eşîrê.

Ehmed Beg ko li biniya dîwanxanê li ser çokan rûniştibû û li ber kerb û kînan erd û esmanan ew nedihebandin, banz da nav axiftinên Mîrî û

Hesêyi û got:

»Bavo bibexşîne apê Hesê rast dibêje. Her ji me ra jî şerm e, ko pehle-

wana me here şivanekî bike.«

Mîrî sexera wî bir û gotê:

»Lawo şivan jî pehlewan e. Şivan bû, yê çi lê bê. Her kes ji me jî her şî-

vanê mala xwe ye. Tu rûnê kesî daxwaza ridênsipîtiyê ji te nekiriye.«

Eva yekimîn car bû, ko mîrî weha, ew jî li dîwanxanê da, li ber çavên giştî rûniştîyên dîwanxanê sexera kurê xwe yê mezin dibir. Mîr keyfxoş

bû, ko şivanê wî pehlewan derketiye. Lê hay ji kula dilê Ehmed Begî nibû. Nizanî ka Ehmed Beg çima weke qelîneka li ser sêlê natebite.

Ew

bi du hegeran keyfxoş bû. Yek ew bû, ko şivanê wî pehlewan derketiye.

Ya duyê jî ew bû, ko bi vê zewacê ra pehlewana wî ya navdar, Werdeka

mêrbizdîn dê li nav êl û zoma wî da bo hemêşe bima û neçûya neketa li

bin destên pehlewanên neyaran da.

82 BILÎCAN

Bi dengê Mîrî ra Ehmed Begî serê xwe kire ber xwe û paşî qaseke kurt

rabû û paşopaşo ji dîwanxanê derket.

Mîr tûre bibû. Teqla dengê wî hatibû guhestinê. Hema bi teqla tûre û

hêrs berê xwe li ser Hesêyî da kir û gotê:

»Hesê eva mercê qîza teye. Qîza te bixwe bi şivanî ra milmilanê kiriye.

Çi kesî ko bizorê qîza te nekişandiye meydana milmilanê. Ev ya te dibe

bêmercî. Ta niha he li ser wî mercê qîza te, bi dehan kes mirin e. Bê avirû

bûne. Gelo wakî li çolê qîza te şivanê min li erdê bida, te yê li şivanê min

biboranda? Te yê ew neda daxkirinê?»

Îca hîviya bersiva Hesêyi va nema û bixwe bersiva xwe da û got: »Na bi

pîr û pêxemberan. Te dê şivanê min jî bêavirû bikira.«

Hesêyi serê xwe kiribû ber xwe û çî tişt nedigot. Mîrî dîsan jî jê pirsî:

»Ma wisan nîne Hesê? Tu bo bersiva min nadî?«

Paşî bîstekê Hesêyi ko kûr diponijî, serê xwe li ber xwe derxist û bi dengê duteqil ko rehên tûretî û fedîkirinê lê diyar dikirin, bersiv da:

»Ez ewê milmilanêya li pesêvan da napejirînim. Eger şivanê te rastî pehlewana e, bila careke dî li meydana zoranê da li pêş çavên giştî xelkê êlê

bi Werdekê ra milmilanê bike. Ez dîsan jî li ser gotina xwe me. Lê Mîr evê

jî bizanibe, ko ez li şivanê te derbas nabim. Eger şivanê te torand, ezê

bixwe bi van destên xwe ewî dax bikim. Bila ji yên dî ra jî bibe nimûne û

nemûş.«

Mîrî got:

»Baş e, lê ew milmilanêya li bêriyê da dê çi lê bê?«

Hesêyi got:

»Ew ne tê ye Mîrê min.«

Mîrî got:

»Em debê ko bîr û hizra Silêmanî jî bizanibin.«

Paşê berê xwe li ser dîwaniyan da kir û got:

»Hûn çi dibêjin, gelî ridênsipîno ?!«

Komelê ko ta niha têkilî bi gotinên Mîrî û Hesêyi nekiribûn, weke de-

riyayekê hurmicîn û her yekê bersivek da:

— Erê lê Mîr rast dibêje, Silêman jî gereke pê bihese.

— Erê erê, wisan e, Silêman jî debê ko li vê biriyara we agadar be.

— Erê lê ma hema wisan nabe ku.

— Erê lê ew jî pehlewan e.  
— Lê lê pehlewan e.  
— Silêman? Ew pehlewanakî xurte.

83

BILÎCAN

— Hero ta roja îro kesî pişta Werdekê li erdê nedabû, ewî li erdê da.

Ew

pehlewanakî qerah e.

Zimezim ketibû dîwanxanê. Her yekê tişteki digot. Lê hemûyan pesnê

pehlewantî û mêrxasiya Silêmanî dikirin. Te digot qey ev çendik û çend

sale ko ewan Silêmanî wek pehlewanakî qerah û navdar dinasin.

84 BILÎCAN

9

Tavê hê lênedabû. Taze hewa ronahî dibû, ko du teter şandin û Silêman

li ber pezî anîne dîwanxanê.

Silêman li ber derê konî, li ser darê edebê rawestabû. Mîrî bi zorê ew da

rûniştandinê. Li ser çokan rûnişt. Mîrî bi devken lê pirsî:

»Kurê min rast e, dibêjin te li milmilanê da Werda pehlewan li erdê daye?«

Silêman serê xwe kire ber xwe da û bi şerm û fedî got:

»Erê ez benî rast e.«

— Lê Hesê Dûdê napejirîne. Dibêje ez wê milmilanêya nepenî da

napejirînim. Dibêje gereke careke dî, ser ji nû, li pêş çavên min milmi-

lanê bête kirinê. Tu çi dibêjî ?«

Silêmanî serê xwe kiribû ber xwe û li nav hizran da diçû.

Mîrî dîsan jê pirsî:

»Te çi got?«

Silêmanî he bi zorê karî bêje;

»Bilanê.«

— Wate tu amadeyî careke dî bi Werdeka pehlewana ra guleşê bigrî?

Tu

amadeyî? Tu ji xwe ra dibînî?«

— Erê.

Silêmanî nedikarî zêdetir biaxifta. Li ber şerman gewiriya wî hişk bibû.

Xûyî dabû. Xûyî zipikzipik li ser eniya wî rûniştibû.

Lê sêveke sor nedîçû devê Mîrî. Mîrî sîngê xwe paqij kir û dengê xwe

xweş kir û got:

»Ca yek ji we here, bêje mala Hesêyî, bila Werdek xwe amade bike.

Pehlewana min vaye amade ye.«

Peyayek ji xîvetê derket û ber bi mala Hesê Dûdêyî rêket. Li dû wî ra

Mîrî ferman da, ko meydana zoranê avreşandî û paqij bikin û gazî begzadan bikin, bila li depa hawarê bidin.

Li dû vê fermana Mîrî ra, hê qelûnkêşek nebihorîbû, ko bû girmîna duholê û tûtîna zurnayê. Li dû dengê duhol û zurnayê ra komel weke

## BILÎCAN

xezelên xezelwerê, libên barana buharê û xîzên çemên payîzê  
rijiyane do-  
ra meydana zoranê. Pistepista wan bû, li guçkên hevdu da xeber  
didan.

Lê li ber dengê duholê û hera û gaziya begzadan kesî dengê kesî  
nedibi-

hîst. Mîr û Mela Ehmed bi koma ridênsipî û giregiran va Silêman  
dane

nîveka xwe û anîne meydana zoranê. Serê Silêmanî hema wisan li  
ber da

bû. Begzadan li dû miqamê hawarê ra li miqamê siwaran dan û li dû  
ra jî

li miqamê şeri dan. Di gel miqamê şeri Silêman dakete nîveka  
meydanê.

Bû fîqîna komelê û fîtandin Silêmanî. Dengê Silêman Silêmana  
komelê

li ser dengê duhol û zurnayê diket. Werdê li goşeyekî meydanê da  
rawes-

ta bû. Serê wê li ber da bû. Weke her car serbilind û gulşa nibû.  
Şerm

dikir. Li şikesta xwe şerm dikir. Kundê şermê li mala dilê wê da penc  
ved-

abû. Serşor bû. Li cîhaneke dî da bû. Eve yekimîn car bû ko li zoranê  
da

pišta wê li erdê ketibû. Diponijî. Li nav hişê xwe da diçû. Taze navê  
Silêmanî li ser ketiye. Taze navê şikestê li ser ketiye. Bûye leke. Bûye



dengî. Taze cîhan pê hesiya ye, ko şivanê Mîrî ew li zoranê da li erdê daye.

Şivan û bêrîvanan hemûyê ew zoranêya wan bi çav dîtine. Taze eger vê

carê bext bibe yarê wê û Silêmanî li erdê bide jî, bêçineye. Taze eger Silêmanî li ber çavên vê civatê, li ber çavên vê komelê hilde û li ser taqa

piştê li erdê bide jî, bêçineye. Heta hebe jî, ew nava yê li ser ranebe.

Nav

li ser ketiye. Navê şikestê. Şikest ji şivanekî.

Tişteke nehînî li nav da dil û canê Werdekê dixwar. Hêzekê li ser hemû

hêzan ra ferman didayê; ko êdî kuta bû. Êdî şuxul şile kiçê. Dest ji zoranê

bikêşe. Yan jî hema xwe bi destê wî va berde. Bila vê carê jî li ber çavên

komelê, li ber çavên Mîrî, li ber çavên day û bab û her heft birayên te, li

ber çavên êl û malbata te, te li erdê bide. Bila hemû bizanin û bibînin ko

ew hêjayî wê hindêye, ko bibe xudanê sîng û berên te. Mafê wî heye, ko

te ji xwe ra bi mêranî ji devê hezaran hût û lehengî da derîne û li pêş çavên

wan li te bibe xudan. Erê evê hêza nedîtî û nebînayî, evê hêza dinyaya

nadiyar, fermana cîhana nebînayî ferman didayê, ko bila vê carê jî

Silêman te li erdê bide. Lê quretiya nav dilê wê, pehlewantiya wê,  
nav û  
dengê wê, ew li dijî vê fermanê radikir. Hêzeke nediyare dî ew han  
dida  
û digotê kiçê li ber xwe bide. Tu şerma serê bav û birayên xwe nakî?  
Tu  
şerma pehlewantiya xwe nakî, ko tu dixwazî dest ji ber xwe bikêşî û  
xwe  
bi destê şivanekî va berdî? Kiçê nehêle Silêman vê carê te li erdê  
bide.  
Nehêle şikest dupate bibe. Kiçê! Mirov li nîviya zîrarê da jî bizivire  
kar e.  
Nehêle zîrara te dupate bibe. Lê fermana dî hay lê dikir û digotê:  
kiçê zi-  
rara çî, halê çî?! Mêrik hêjayî wê hindêye ko li te bibe xudan.  
86 BILÎCAN

Du hestên dijber û dijwar, du hestên hêzdar li hemberî hevdu da  
rawestabûn. Her yekê dijî ya dî ferman didayê. Gelo serê xwe ji  
kîjanê ra  
xwar bike, kara wê ye? Axo bi gotin û gura kîjanê bike? Kîjan ferman  
li ser  
berjewendiya wê diferime? Ber xwe bide, yan hema xwe li destê wî  
va  
berde? Li nav van bîr û hizrana da dipilpitî. Nizani û nikari biriyarê  
bi-  
gre.

Bi fîtîna komelê ra serê xwe li ber xwe derxist û Silêmanê tevgirêdayî li

hemberî xwe dît. Di gavekê da çavên herduyan li hevdu asê bûn.. Bi tirîş-

ka çavên Silêmanî ra tişteke bînanî germayê li dilê Werdekê geriya.

Bêhemdê xwe şa bû. Lê zû ji şabûna xwe poşman bû û serê wê dîsan kete

ber da. Komelê diledilî Silêmanî didan. Silêman li ber Werdekê rawest-

abû. Dîsan çavê wî bi bejin û bala Werdekê, bi gerdena kêle mermerîn û

zend û bendên sipî û tevkutayî û navqeda zirav ket. Lê daxa kulîmekan jî

hate bîrê. Herduyan pêkve dest avîtin navtengên hevdu û hevdu birin û

anîn. Taze tav şîrîn bibû. Taze roj nêzeyekê bilind bibû, ko herdu pehle-

wan destopişkî hevdu bûn.

Mîrî gazî kir:

»Ha Silêmanê pehlewan! Kanê tu çi dikî ha? «

Bi dengê Mîrî ra hurmehurm kete komelê û hemûyê han dane

Silêmanî:

— Ha Silêman! Ha pehlewanê navmilpan!

— Ha pehlewanê qupêz!

— Ha mîrê meydanê!

— Kuro xwe bidê!

— Aha! Aha!

— Hema vê carê!

- Aha, kuro derfendê nedê!
- Silêman ! Silêman !
- Xwe bidê hema hindik maye, ha!
- Hema kûşkê maye, ko tu heyfa pehlewanan jê vekî!
- Ha gurbizê mêran!

Lê li nava deng û hera û diledanê da, ev dengana jî li ber guçkên mirovî

diketin:

- Kuro Werdek jî qet fesalê nadê ha!
- A, ma yariye ewê bi dehan pehlewan biçandine.

Werdekê bi dil û can li ber xwe dida. Du, sê caran Silêman li vî serê meydanê bire serê hanê û hanî. Silêman kire kirkaşê. Zor da Silêmanî û

87

BILÎCAN

bi giştî hêza xwe va tawa xwe avîte ser Silêmanî. Hindik mabû, ko pişta

Silêmanî li ber tawa wê bitewiya. Lê dengê komelê ko han didane Silêmanî, ji Silêmanî ra bû hêz û şiyar. Ji dilê Silêmanî ra bû istûn. Silêman li ber xwe da û bizorê karî xwe bigire.

Werdê ew kiribû jêr zorgivişkan. Hingên kelan didayê û ew li vî serê meydanê dibire serê hanê. Silêman he bi zorê bergiriya xwe dikir.

He bi

zorê li ber xwe dida. Lê li her alî tenê navê Silêmanî bû, ko li ber guçikan

diket. Her tenê bav û bira û çend malên Êzdiyan navê Werdekê dianîn.

Ew jî dengê wan li nav deryaya dengê komelê da bezir dibû.  
Werdekê li dilê xwe da got:  
»Ev komela durû! Ta duhûnê jî hemûyê diledilî min didan. Lê îro çi-  
ma ko mîr diledilî min nade, hemûyê ez ji bîr ve kirime.«  
Evê hindê qudûmê Werdekê sist dikirin. Werdek tûşî dudiliyê dikir  
û  
li ser bîr û mejiyê wê da kar dikir. Xwest hema xwe di gavê da  
bispêre  
destê Silêmanî û xwe li ber da bavêje erdê. Lê quretiya wê hate  
coşê.  
Dîsan zor da Silêmanî û ew du caran li vî serê meydanê bire serê din  
û anî.  
Silêman ketibû kirkaşê. Hindik mabû hema vê carê xwe li destê wê  
va  
berda. Hindik mabû, ko dest ji ber xwe bikişanda, lê gazî û qûtîna  
komelê ew hanî coşê û karî xwe li ser piyan bigre.  
Li beriya nîvro da herdu pehlewana daketibûn meydanê û wisan  
yekbîn  
hevdu dibirin û dihanîn. Lê bi hevdu nikarîn. Nîvro dageriya jî her  
wisana  
hevdu dibirin û dihanîn. Komel jî he wisan hemû li dora meydanê  
rawes-  
tane û çît girtine û li pehlewana dinihêrin. Bû piştî nîvro jî, dîsan  
kesî bi  
kesî nikarî. Bû berî êvarê jî dîsan kesî bi kesî nikarî. Êvar pê ra gihîşt  
jî  
dîsan he herdukan hevdu hevraz û berjêr dikirin û hingên kelan li  
hevdu

didan. Roj hêdî hêdî ber bi ava diçû. Tavê xwe bi çiyayên rojava va daliqand û maça malavayiyê da erdê jî, dîsan he herdu pehlewana hev-  
du dibirin û dihanîn. Sî dageriya. Siyê xwe da ser meydanê û nîvê mey-  
danê li siyê da wenda bû. Siyên Werdekê û Silêmanî bînanî du dêwên reş  
û dirêj lê hatin. Siyên wan lev dialiyan. Siyên wan pêkve dihejikîn.  
Tevî  
hev dibûn. Jêk diqetiyên. Dîsan lev dialiyan; berebere siyê meydan  
bi  
giştî dagîr kir. Siyên Silêman û Werdekê êdî neman. Cîhan kete jêr  
des-  
thelatdariya reşatiyê. Perda reşe şevê berebere xwe avîte ser  
meydanê. Bi  
fermana Mîrî çar nikarî meydanê pê agir û şemalkan ronahî kirin. Li  
dû  
hilbûna agir û şemalkan ra dîmena meydanê hate guhestinê. Alavên  
agir  
û ronahiyên şemalkan û dûkela agirê darên çamê têkelî hevdu bûn.  
Bi fermana Ehmed Begî bi darên çamê koziyek hilkiribûn. Kozî gur  
88 BILÎCAN

bibû û çend daxik jî kiribûn nava koziyê da. Daxik li nav koziyê da  
sor  
bibûn. Daxik bibûn piling. Ehmed Beg çavniher bû, ko dîsan weke  
her  
car bêhna kozûrekê li ser xelkê bixîne û bi wê yekê xwe li ber çavên

Werdekê şîrîn bike.

Bêhna dûkela darên çamê da serê Silêmanî. Daxa kulîmekê kete bîrê.

Li ber xwe da û vê carê ewî kûşkê Werdek ji cî leqand. Li vê navberê da

dîsan qûtîn bi komelê ket û navê Silêmanî dîsan kete ser zar û zimanan û

hemûyê navê Silêmanî dihanîn. Bi vê qûteqûtê ra benda dilê Werdekê

sist bû. Te digot qey dibêjinê kiçê êdî bes e. Kiçê xwe bi destên Silêmanî

va berde. Kiçê me hemûyê pêxweş e. Hema rastî jî Werdekê seha tenêtiyê

dikir û evê sehê jî li ser giyanê wê da kar dikir. Tenê mabû. Silêmanî dîsan

du caran ew ji cî leqand û vê carê ew li vî serê meydanê bire serê hanê û

anî. Lê Werdekê li ber xwe da. Dîsan wekî çendîn carên dî Silêman kire

kirkaşê. Silêmanî li ber xwe da. Ewî giştî hêza leş û heşê xwe berev kir û

Werdek lev pêça û li nîveka meydanê da, hindî zora wî hebû, da xwe û

xwe li ser Werdekê da avît. Werdekê zorgivişk danê û pişta xwe rast kir û

destên xwe li sebeta sîngê Silêmanî da werpêça. Hindî zora wê hebû, da

xwe û sebeta sîngê Silêmanî guvaşt. Qirpeqirp bi pişt û pîlên  
Silêmanî

ket. Silêman vê carê dîsan hindî zor û şiyana wî hebû da xwe û xwe  
bi giştî

hêza xwe va li ser Werdekê da avît û ew hêdî hêdî li ser piştê da  
tewand.

Qûtîn bi komelê ket:

— Ha hindik maye, ha!

— Ha Silêman bav û birayê min ha!

— Ha şêrê navmilpan, ha!

— Ha pehlewanê min, ha!

Ev dengê Mîrî bû, ko li ser hemû dangan ket û li guçkên Silêman û  
Werdekê da zingiya. Bi van dengana ra, Silêmanî dîsan zor da xwe  
û ne-

hêla Werdek pišta xwe rast bike. Dîsan navlinganî avîte ber lingê  
Werdekê û ew xwaromaro kir. Hindî Werdekê li ber xwe da, nika  
vê

carê pišta xwe rast bikira. Pišta wê hêdî hêdî tewiya û bejna wê  
weke bej-

na dara merxê ko ketibe ber hêrişê tevir û bivirên darbirên dilkevir,  
li ser

erdê da xwar û mêl bû. Benda porên wê vebû û serê zulf û keziyên  
wê axa

sar ramûsandin. Li dû ra lingên wê li ber fistiqîn û hêdî hêdî pišta  
wê li

nav destên Silêmanî da gihîşte erdê û bo cara duyê şan û pîlên wê  
bi destê

Silêmanî di gel erdê sikî sar nasiyar bûn.



Civatê pêkve bi deng û hera û qûtîn li çepikan dan û tevî tiplequtanê  
bû Silêman Silêmana wan:

89

BILÎCAN

- Bijî Silêman!
- Her hebî Silêman!
- Ser xwe bî Silêman!
- Bijîn Werdek û Silêman!
- Bijîn herduk!

Mîr li ciyê xwe rabû. Civat li ber tîş bû. Mîrî pê dana naverasta meydanê û destê Silêmanî kire nav destê xwe yê rastê û destê Werdekê jî kire

nav destê xwe yê çepê. Destê Silêmanî bilind kir û nîşanî komelê da. Dîsan qûtîn bi komelê ket:

- Silêman!
- Silêman!
- Silêman!

Mîrî li naverasta meydanê da pêş da çavên Silêmanî û paşê jî neitika Werdekê ramûsî û destên herdukan ra girt û berê xwe li ser komelê da kir

û got:

»Gelî komela hêja! Li îro şûn da Silêman kurê min û Werdek jî bûka min e. Sibê li ber derê mala min zemawenda Werdekê û Silêmanî ye.«

Deng û heraya şadiyê li ser komelê ket:

- Pîroz be!
- Pîroz be!

Vêca li nav deng û heraya komelê da Mîrî bi destên herdu pehlewên

xwe ra girt û ew li meydanê deranîn. Li wê demê da dayika Werdekê ji

nav komê derket û hat û destê wê ra girt û pişt û pîl û gurmik û kulîmekên wê ji ax û tozê dakuta û ew di gel xwe ber bi malê bir.

Serê

Werdekê li ber da bû.

Civat belaw dibû, ko mîrî gote car çiyân:

»Horo carê bikişînin û bêjin bila sibê çi kes li derekê da neçe. Sibê li ber

derê mala min zemawenda Silêman û Werdekê ye. Ezê zemawenda wan

bikim. »

Bû qûtîna carçiyân, û komel jî berebere jêk belaw dibûn.

Wê şevê li giştî malên êlê da gotin her li ser guleşa Silêman û Werdekê

bû.

90 BILÎCAN

10

Taze tavê pencên xwe yên narincî kutabû serê qafên çiyayên bilind.

Taze

zeratiya tavê li ser qûçên kolozên bilindçiyân dibiriqî, ko girmîn bi duholê û tûtîn bi zurnayê ket. Dengê duholê li piştta heft çiyayan ra der-

bas dibû û der û cîran hemû pê dihesand. Dengê duholê dikete çiyân û

deng vedida. Mirovê nenas yê bigota qey bi heft destan duholê dikutin.

Qeroyê begzade hindî milê wî digirt, digurmande duholê. Xelk taze ji

xew radibûn, ko dengê duholê û miqamê zurnayê kezîkên çokên wan ler-

izandin. Bi bihîstina dengê duholê ra, milmilanêya duhûnê hate bîra wan. Ca hemûyan karê dîlanê kirin. Mêr û jin û pîr û kal û mezin û biçûkan xwe tev xemilandin. Hemûyê bi hev ra digotin û dikenyan. Xemil û ken û şabûna wan ceşna Newrozê dihanî bîra mirovî. Xelk deste

desteber bi mala Mîrî diçûn.

Mala Mîr Elî Siwaranî deh danzdeh kon û xîvet bi hev ve girêdabûn û

kiribûn yekê. Mêrên Êlê gultegulte diçûne wê xîvetê û silav li Mîrî û li

komelê dikirin û her kes li ciyê xwe da li ser kulav û doşik û bistirên ko bi

berpal û palgî û piştekan hirî û mafûr hatibûne rêkxistinê, rûdiniştin. Ta

ko xîvet ji komelê pingirî. Vî alî, wî alî ta ber derê xîvetê koma mêran li

rex hev rûniştibûn. Êdî li xîvetê da cî nemabû.

Mîr ko li serê jorê li ser doşika mexmerî rûniştibû û palgiyên per li ser

serê wî ketibûn, ciyê xwe xweş kir û got:

»Gelî carçîno ca careke dî jî bikişînin, kanê çî kes nemaye?«

Carçî derketin serê girê pêş xîvetê û du, sê dengên dî jî gazî kirin:

»Hay Yezdan ji we xweş be, haaa...Mîr dibêje bila çî kes li mala xwe da

nemîne. Hay...werin dîlanê ho...«

Li dû gaziya carçiyar ra du, sê kesên dî jî hatin û li biniya xîvetê li ser çokan rûniştin.

Carçiyek zivirî hundur kon û got:

»Ezbenî ji bilî zarên mala Hesê Dûdêyî çî kes nemaye, hemû hatine.«

Mîr kenîya û got:

»Ka tu dibêjî em gazî Hesê Dûdêyî jî bikin!«

91

BILÎCAN

Pîrçîn kete komelê û hemû kenîyan û hundur xîvetê weke deriyayeke

pirpêl hurmicî.

Êla Mîr Elî Siwaranî hefthezâr û heftsed mal bû. Li serê malê mêrek hatibû zemawendê. Hefthezâr û heftsed mêr li rex hev li xîveta bi hevva-

girêdayî da rûniştibûn. Dûkela qelûnan li hundur xîvetê da weke mija

çiyayê Elegezê lev digeriya. Yên ko digotin, yên ko dikenîyan. Li ber axiftin û got û bêjê, kesî dengê kesî nedibihîst. Derva jî hemîn gurmîna

duhol û tûtîna zurnayê bû. Qîz û xortan bi destên hev ra girtibûn û li ber

miqamê duhol û zurnayê bi ger dîlan digerandin. Dengê şayî û herayê

guçkên felekê ker dikir.

Paşî demeke xurt dengê duhol û zurnayê vetexirî. Bi vetexirîna dengê

duhol û zurnayê ra Mîrî çav li berdestkan kir, ko xelatan bînin. Li dû fer-

mana Mîrî ra xelat li nav sêniyeke mezine zeng da anîne hundur.

Satoreyê begzade ketibû pêşiya sêniya xelatan û bi miqamekî sivik li

neyîkê dixist. Berdestkan sêniya xelatan li naverasta dîwanê da danîne ber

Mîr û Mela Ehmedi. Satoreyê begzade hê jî li neyîkê dixist. Mîrî destê

xwe avîte berîka xwe û pareyek deranî û raberî wî kir. Satore hema wisan

ko neyîka wî li ser lêvan bû, ber bi Mîrî çû û serê xwe jê ra tewand û pare

ji destê wî vegirt. Bi vegirtina pareyan ra dengê neyîka wî jî ker bû.

Mela Ehmedi berê xwe li ser wî berdestkê ko sênî anîbû, kir û jê pirsî:

»Bêje kanê xelatên we çine?«

Berdestk te digot qey li ber perokeke nivîsandî dixûne, hema wisan li

ser piyan rawestayî dest pê kir:

»Du qol zêr, gerdeniyek, dotek, bercênîkek, kofî û gula qotikê, tasku-

lawek, sê gustîlên almast, du bazinên gewhernîşan, cubeyekî gulavtûn,

destek cil û bergên bûkîniyê, xêliyeke sor û zere kurdî û dusedhezar diraf

pare.

Berî hemûyê Mela Ehmedi û paşê jî komelê hemûyê bi hev ra gotin:  
»Pîroz be! Mala te ava be Mîr!«

Zimezim ketibû hundurê xîvetê. Li nava deng û herayê da berî hemûyê

Mela Ehmedi dest avîte berîka xwe. Kîsîkekî armûşîn li berîka xwe der-

anî. Helboqa derê kîsîki, ko bi bendekî rengareng vehûnayî, girêftik

lêdabû, vekir. Zêrekî zer jê deranî û avîte ser sêniya xelatan. Li dû wî ra

komelê hemûyê dest avîtin kûrik û berîkên xwe û kîsikên rengareng jê

deranîn. Li berêkê da her yekê zêrek avîte ser sêniyê. Li qasekê da heft

hezar û heftsed zêrên bi Kurdî tûrandî li ser sêniyê bûn qûç. Sênî û xelat

li bin zêran da wenda bûn.

92 BILÎCAN

Li dû xelatan ra qawegerînan qawe gerandin Û piştî vexwarina qawê

sêniyên firavînê li dû hev ra kişiyane hundurê xîvetê.

Li dû firawînê ra dengbêjan dest dane peleguhên xwe û dest pê kirin lawûje û stiranên evîndariyê û mêraniyê gotin.

Şeş roj û şeş şevan govend li ber derê mala Mîrî geriya. Dengê hoy

şabaşoya begzadan carinan li ser dengê duhol û zurnayê diket:  
»Hoy şabaşo hoy!...Malî ava !...Resoyi zêrek li ser serê kurê Dadoyi  
ra  
şabaş da. Malî ava! Şabaşo ho...y!  
Malî ava! Kakoyi dused diraf li ser serê kiça baviki ra da! Malî ava  
Kako  
! ho...y şabaşo!...«  
Komelê li ser serê xoşewîstên hevdu ra şabaş didan. Begzadan carê  
li  
miqamekî didan. Li dû miqamên begzadan ra bû gereda dengbêjan.  
Du dengbêjan bi hev ra dest bi lawûjên govendê kirin. Yekê digot û  
yê  
dî lê dizivirand. Hindek caran jî li nîveka wan da şerebend çê dibû.  
Bend davîtin hev û bersiva hevdu didan. Li dû şerebendan ra  
Ehmedê  
dirêj ko zêdenav digotinê lawijo, dest pê kir û şeşbendiyeke dût û  
dirêj  
li bêhnekê da got. Li ber şeşbendiya wî genc û lawan cergebez  
girtin.  
Qîz û xortan bi destên hev ra girtin û gera govendê fire kirin. Ser û  
binê  
govendê gîhabû hev.  
Şeva heftan du, sê porsipî û çend jinên navsalî bi çend dengbêjan  
va  
çûne desthinekirin û xemilandina bûkê. Xelatên bûkê kirin çend  
têrxur-  
can û avîtin ser milên cêrî û berdestkan û bi deng û dep û duhol ber  
bi

mala Hesê Dûdêyî çûn.

Mala Hesêyi wisan ji mala Mîrî dûr nebû. Tenê deh danzdeh mal li nîveka wan da bûn. Gava ko berbûk gihîştin ber derê mala Hesêyi, hema

wisan li derva li ber dengê dengbêjan govend girtin. Govend du, sê seriyên geriyabû, negeriyabû, ko Kewê, jina Hesêyi hate tevî govendiyan

bû. Serçopiya guvendê ra girt û govend gerand. Hesê jî li dû ra hat û destê

xwe kire berîka xwe û sêsed diraf li berîka xwe deranî û da dengbêjan. Li

dû ra got:

»Fermûn hundur! Fermûn!...Fermûn!«

Govendê jev berda û komel tev ber bi jor çûn. Li ber derê xîveta mala

Hesêyi dengbêjên mala Mîrî hev ra destên xwe dane peleguhên xwe û

dest pê kirin lawijên evîndariyê û mêraniyê gotin.

Kurê Hesêyi yê nîvekê, ewê ko hevalpişkê Werdekê bû, ew jî dengbêjekê baş bû. Gava ko dengbêjên mala Mîrî dest pêkirin, ew jî hate pêşiya wan û li bersiva wane da, ewî jî qûrî stiraneke evîndariyê kir û

93

BILÎCAN

berpêlavka wan da.

Hemû tev bi ken û şayî daketin hundurê konî. Pêş da Hesêyi û li dû ra



jinka wî serçavanî dane mêvanan.

Piştî xwarin û vexwarinê berbûkan destûra desthinekirina bûkê ji jina

Hesêyi xwestin:

»Eger destûra we hebe, emê destê bûka xwe hine bikin?«

— Destûr li dest we bixwe daye. Fermûn !

— Yezdan ji we xweş be!

Li dû van tekîlfane ra berbûkan derê têrxurcan vekirin û xelatên bûkê

deranîn û xelat yekoyeko nîşanî rûniştiyan dan. Bi nîşandana her xelatê

ra hemûyan bi hev ra digotin:

»Pîroz be! Sed car pîroz be! Mala we ava be! Mala Mîrî ava!«

Piştî nîşandana xelatan berbûka biçûk torbeyek hine ji xurcê deranî û

hine kire avê da. Vêca hine danî ser sêniyekê û bi lawije ber bi bûkê çû û

serê deh tipilên bûkê hine kirin. Gava tipilên bûkê hine kirin, berbûkan

bi hev ra dane tilîliyan. Li dû ra berbûka biçûk ew hina li ber tewawî rûniştiyan gerand. Her yekê serê tipila xwe ya qilîçkê di hinê ra kirin û li

dû ra bi gotina pîrozbayiyê, pare li berîk û quşên xwe derxistin û avîtin

ser sêniya hinê. Li dû hinekirina destên bûkê ra berbûkan şîrînî û şerbet

gerandin.

Hindî zemawend dest pê bûye, Silêman jî li mala Mela Heseni daye.

Kurê Mela Heseni yê mezin ko dibêjinê Mîro, bûye birazava. Destek şal

û şapikên nû li Silêmanî kirine. Silêman li ser doşikekê bi palgî û berpâl

rûniştiye. Koma genc û lawan dora Silêmanî ra girtine. Dibêjin û dikenin. Yê stiranê dibêjin. Yê laqirdî û henekan dikin. Yê qewlik û

pêkenokan vedigêrin. Her yek têdikoşe bi curekî keyfa Silêmanî xweş

bike. Di gel desthinekirina bûkê, li mala Mela Heseni da jî rê û şûna desthinekirina zavê dest pê bûye.

Roja heftan dengê duhol û zurnayê ji yê her roj bilindtir bû. Mîrî ferman da Begzadan û got:

»Kuro ca qasekê li miqamê siwaran bidin, bila komel demekê cirîdanê

bikin.«

Bi fermana Mîrî ra begzadan duhol û zurnayên xwe hildan û xwe dane

girê fêza malan û dane miqamê siwaran. Bi bihîstina dengê miqamê si-

waran ra, her kesî banz da hesp û mehnegî û kehêlên xwe ji extirmexane

û tewlexanan li ser tewil û bendan vekirin û zîn û pûsad kirin û daketin

meydana cirîdanê.

94 BILÎCAN

Besta biniya malan bû meydana cirîdanê. Siwaran bi rêz dabûne dû hev

û li besta biniya malan da guroverkek xir çêkiribûn. Meyteran bi fermana

Mîrî mehnega Ehmed Begî jî jê ra zîn û pûsad kiribûn. Dizgîna wê ra girtibûn û hîviya Ehmed Begî bûn. Piştî wê hindê ko siwaran du, sê seriyên dane cirîdê, Ehmed Begî jî ne ji dil li mehnega xwe siwar bû û

dakete meydana û toz li ser siwaran xist. Hespê çî siwarî bi mehnega

Ehmed Begî ra nedigihîşt. Mehnegê ser û dêlên xwe kiribû yek. Siwarê

xwe li nava ser û dêlan da, li nava dêl û bijiyên da wenda kiribû. Li mey-

dana cirîdanê da siwaran rêz û guroverkî dabûne dû hev. Hindik mabû

ko ser û binê gera cirîdanê bigîje hev. Te ko dûr va weha li gera cirîdanê

mêze bikira, te yê bigota qey gustîleke, ko li nava tozê da cûm kirine.

Hespê çî siwarî pêşiya mehnega Ehmed Begî nediket. Yan pê ra nedigi-

hîştin. Yan jî nediwêrîn li pêşiya wî bikevin. Yan jî diqewimî, ko rêz û

ihtiram jê ra digirtin.

Piştî demeke xurt hesp li xûyê da man. Êdî begzade ji kutana duhol û

jenîna zurnayê, siwar jî ji bezandinê û hesp jî ji bez ketin. Dengê  
duhol û  
zurnayê ker bû. Siwaran bi rêz dane dû Ehmed Begî û li biniya malan  
da  
li hespan peya bûn.  
Meyteran banz dan û serê mehneqa Ehmed Begî ra girtin û ew li  
dora  
xîvetan ra birin û anîn û gerandin, ta ko xûya wê sar bibe.  
Li dû cirîdanê ra koma mêran bi komel daketin hundur xîvetê. Îro  
êdî  
dema wê hindêye, ko biçin û bûkê bînin. Piştî wê hindê ko her kes  
li ciyê  
xwe da rûnişt, qawegerînan qawe gerandin. Li ber deng û axiftina  
bi  
komel li nava xîvetê da kesî dengê kesî nedibihîst. Ehmed Beg jî tevî  
komelê di hundurê xîvetê da rûniştibû. Herçend ko Ehmed Beg  
têdikoşî,  
xwe keyfxweş nîşan bide, lê li reng û rûyê wî ra diyar bû, ko kulek  
di dilê  
wî da heye. Rûçkê wî dûr va gazî fikir, ko tiştê li hundur da dilê wî  
dixo.  
Derdek li hundur da pencûrekan li hinavê wî dide û dil û kezeba wî  
vediroje. Rengê wî hatibû guhestinê. Carnan diroda xwe dikenand.  
Lê  
kena wî her li ser lêvên wî yên bizmirî da hişk dibû. Kena ne ji dil bi  
zi-  
manê bêzimanan gazî dike. Ew kena tabloyeke, bîneyeke ji bîneya  
hun-

duranî, ko giştî penî û nepeniyên hundur dide derê. Neynûka bîr û  
hizrên veşartîye. Her kê pêş da Ehmed Beg dîtibû, dê li reng û rûyê  
wî yê

îro ra bizanibiya, ko tişteke hatiye serê wî. Dê bizanibiya, ko dema  
Ehmed

Begî saz nîne. Yê bizanibiya, ew li ser hemdê xwe nîne. Dê bizanibiya  
ko

tişteke li dilê wî da heye, lê naxwaze, yan nawêre eşkere bike. Nikare  
ewê

razê ser ve bike.

95

BILÎCAN

Mîr Elî Siwaran ji cî hilqedimî. Ciyê xwe xoş kir û li dû ra du, sê caran  
xwe kuxand. Ev e duruşmeke taybete Mîr Elî Siwarani bû. Hemûyê  
wateya vê duruşmê dizanîn. Bi kuxiyana Mîrî ra, tu çawa berekî  
bavêjî

gola beqan, civata di hundurê xîvetê da jî wisan bêdeng bû. Gava  
ko ci-

vat bêdeng bû, Mîrî got:

»Gelî ridênsipîyan em niha dixwazin herin û bûkê biguhozin. Lê hûn  
hemû dizanin ko em giştî nikarin weha herin mala Hesê Dûdêyî.

Diqewime cîhê wan teng be. Nabe ko em hindê herin li mal da  
rûnên û

hindê jî li derva rawestin. Ya baş ewe ko em tenê sî çil kesek herin  
û bûkê

siwar bikin û bînin. Hûn hemû dizanin, ma Hesê xelik nîne ku. Bîhanî  
nîne, ko em herin birûşa xwe nîşanî wî bidin. Hûn çî dibêjin?«

Bi vê pîrsa Mîrî ra deh panzdeh ridênsîpiyan bi hev ra gotin:

»Wisa ye ezbenî.«

Bi bersiva ridênsîpiyan ra Mîr Elî ji cî rabû. Bi rabûna Mîrî ra gurîn  
kete komelê û hemû li ber Mîrî va rabûn şîpê. Mîr derkete derva û  
sî çil

kesî dane dû wî û ji xîvetê derketin. Li ber derê xîvetê li hev quricîn.

Jina

Mîrî ya mezin Gulav Xatûn jî bi xemil û xîşilên xwe yê taybetî va, di  
gel

çend berbûkên dî va hatin û tevî komelê bûn. Begzadan dane  
miqamê

Siwaran. Hemû tev rêketin û ber bi mala Hesê Dûdêyî çûn.

Meyterekî jî

mehnegiyek bi zîn û pûsadê taybetî xemilandibû. Ew jî li mehnegê  
siwar

bû û du, sê seriyên bezand û paşê da dû şoşmînan. Hêştirvanan jî  
heft

hêştir bi hev ve girêdabûn û qeterek hêştiran serast kiribûn.  
Hêştirvanekî

jî serê lokê pêşîn ra girtibû, dikişand û ber bi mala Hesêyî diçû.

Hemû tev giheştin ber derê mala Hesê Dûdêyî. Hesê bi koma xizim  
û

kes û karên xwe va derkete pêşiya şoşmîn û berbûkan. Berî hemûyê  
Mîrî

silav lê kir û li dû Mîrî ra yê dî her kesê hindava xwe da silav li  
Hesêyî

kirin. Hesê silava hemûyê vegirt û berbirî duholvani çû û hindek  
pare ji

kîskê xwe deranî û raberî wî girt. Duholvani serê xwe jê ra xwar kir  
û pare

ji desti vergirt. Kewê ya jina Hesê Dûdêyî jî bi koma xwe va hate  
pêşiya

berbûkan û rûyê berbûkan ramûsî û paşî xoşbêjîyê ewan ber bi  
xîveta

Werdekê rênimûnî kir.

Hesê Dûdêyî giştî mêvanên xwe derbasî hundurê xîvetê kir û paşê li  
dû

hemûyê ra kete hundur û hema wisan li ber deri rawestayî destê  
xwe da

sîngê xwe û serçavanî da Mîrî û mêvanan:

»Mîrê min tu bi koma xwe va li ser çavên min ra hatî«

Tenê Mîrî li bersiva Hesêyî da got:

»Zor sipas Hesê! Her bijî!«

96 BILÎCAN

Genc û lawên mala Hesê Dûdêyî xerîkî pejirandinê bûn û qawe  
gerandin. Di gel vexwarin qawê Mîrî berê xwe li ser Hesêyî da, ko li  
ber

derê konî rûniştibû, kir û gotê:

»Hesê hema rastî jî te van rojana dîwanxane vik û vala kiriye. Her  
rastî

me bîriya te kiribû.«

— Zor sipas! Ji dilovaniya te ye Mîrê min!

Paşî vexwarina qawê, Mîrî berê xwe li ser Gelhanê ridênsipî da kir  
û

gotê:

»Gelhan qelenê Werdekê dane ber Hesêyi!«

Gelhan ji cî firikî û xurcika qelenê Werdekê li bin qapûtê xwe deranî  
û

rabû ser piyan û hema wisan xurcika zêran devgirêdayî danî ber  
Hesêyi û

got:

»Pêncsed zêr e. Eger hindik be jî gelekî bizanibe!«

Li dû gotina wî ra, Hesê ji cî rabû û destê xwe da sîngê xwe û got:

»Mîrê min ez razî bi zehmeta we nînim. Werdek her kiça teye.«

Paşê gote kurê xwe yê mezin:

»Êzdîn! Ewê xurcikê dane ber Mîrî!«

Kurê wî ji cî rabû û xurcika zêran li ber bavê xwe hilanî û li ber Mîrî  
danî.

Hesêyi got:

»Ezbenî we ji min ra anî, ez jî pêşkêşî we dikim.«

Lê Mîrî nepejirand û dîsan xurcika zêran da destê Gelhani û Gelhani  
xurcik li ber Hesêyi danî. Hesê li cî da rûnişt û çav li kurê xwe kir û  
gotê:

»Ewê xurcikê hilîne!«

Kurê wî xurcik hilda û bire aliyê malê.

Li dû qelen ra ridênsipiyan hindekî yarî û laqirdî bi hev kirin. Paşê  
Mîrî

berê xwe li ser Hesêyi da kir û gotê:

»Hesê destûrê bide, bila bûkê siwar bikin!«

— Ezbenî destûra me jî her li destê te daye. Werdek kiça teye.

— Serferaz bî Hesê!

— Her hebî Mîrê min!

Mîrî berê xwe li ser Gulî Dengbêj da kir û gotê:



»Here bêje berbûkan bila bûkê saz bikin, Hesêyi destûra me daye!«  
Îca Mîr bi vê gotina xwe ra jî rabû ser piyan. Gava ko mîr rabû şipê,  
komel jî pê ra rabûn û hemû tev derketin derva.

Li derva meyter û hêştirvanan cihêzê Werdekê bar dikirin. Cihêzê  
Werdekê kirin barê heft hêştiran. Hesêyi gote Mîrî:

97

BILÎCAN

»Mîrîm bibexşîne! Bêdem bû. Me cihêzekî wisan nekiriye.«

Mîrî gotê:

»Na, Hesê mala te ava be! Lap cihêzekî baş e.«

Li dû Mîrî ra şoşmînan bi hev ra gotin:

— Mala te ava be Hesê!

— Bijî Hesê!

— Malîava Hesê!

Dîsan dengê duhol û zurnayê der û deşt da ber xwe. Begzadan li  
miqamê Siwaran didan. Bi dengê duhol û zurnayê ra bû şingeşinga  
Siwaran û dîsan li besta biniya malan ketin cirîdê.

Bi dengê miqamê Siwaran ra du berbûkan bi milê Werdekê ra girtin  
û

ew anîne derva. Werdek bi heft qeleman neqîşandibûn û xêliyeke  
sore zer

avîtibûn ser serê wê. Li derva meyterê mala Mîrî li mehnegiyekê  
siwar

bibû û li pêş xîveta Werdekê rawestabû. Gava ko bûk derxistin  
derva, du,

sê ridênsipî jî çûn û bi milê bûkê ra girtin û ew du caran li dora

mehnegiyê ra gerandin û cara sêyan meyrer ji mehnegê peya bû û  
bûk li

mehnegê siwar kirin. Bûka Hesêyi ya mezin tasek av li dû bûkê ra  
avêt û

got:

»Ronakjîn bî! Dawî bi xêr û xweşî !«

Berbûk û şoşmînan xatirê xwe ji mala Hesêyi xwestin û ber bi mala  
Mîrî rêketin. Gava ko Siwaran dîtin vaye bûk siwar kirine, bi cirîdanê  
hatin pêşiya bûkê. Werdekê jî dizgîna mehnegê berev kir û tevî  
Siwaran

kete cirîdanê û sê çar seriyan bi Siwaran ra li vî serê meydanê ta  
serê hanê

da meydanan.

Ji layê dî va birazava bi koma xwe va di gel Silêmanî li hespan siwar  
bûn

û hatin pêşiya bûkê û şoşmînan ewan xwestin ko têkelî Siwaran  
bibin. Lê

şoşmînan hêrişî ser wan kirin û nehêlan ko suwarên desta zavayi  
têkelî

desta wan bibin. Suwarên desta zavayi du, sê seriyan li dora şoşmînan  
û bûk

û berbûkan ra dane cirîdanê û li dû ra bi gultetî zivirîn ber derê  
xîveta

zavayi. Silêman li nava koma birazava da, li wê damê da ko Mîroyê  
kurê

mela Hesênî, birazavayê wî dara bûk û zavatiyê li ser serê wî ra  
girtibû, li

ber derê xîveta bûk û zavatiyê li hîviya bûkê rawestan.

Suwar û peya û bûk û berbûk û şoşmîn tev gihîştin ber derê mala Mîrî. Berbûkan bi zengiya bûkê ra girtin û ew peya kirin. Li wê demê da Silêmanî sêvek virvirande bûkê. Sêva wî li ber koviya bûkê ra derbas bû û genc û lawan sêv li hewale girtin û li destên hevdu revandin.

Mîroyi jî sêniya şekirok û pareyan reşande pêşayîka bûkê. Zarûyan  
98 BILÎCAN

xwe avîtin şekirok û pareyan.

Gulîzer bûka Mîrî ya mezin, maliya Ehmed Begî, hate pêşiya bûkê û li

ber bûkê bi qolanî leyist. Desteyek qîz û bûk jî di gel wê bi leyza qolanî

milê bûkê ra girtin û ew ber bi xîveta wê ya taybetî birin. Li ber derê xîve-

ta bûkê berdestkên mala Mîrî çendîn kasik, dîzik, kuloz, fîncan û feyfûrî

li ber piyên bûkê îşkandin û bûk li ser kaxikên wan dîz û kuloz û fîncan

û feyfûriyan ra derbas bû û kete hundurê xîveta taybete bûk û zavatiyê.

Koma zavayi jî dîsan bi dara bûk û zavatiyê va zivirîn mala birazavayi.

99

BILÎCAN

11

Hê çilê bûkê û zavayi derneketiye. Hê hina bûk û zavatiyê li destên wan neçûye. Silêman li xîveta xwe ya taybetî da rûniştiye. Serê wî di ber daye û kûr diponije. Ketiye deriyaya kûre bîr û hizran da. Di dilê xwe da, xwe ji xw ra dibêje:

»Hey feleka pîr! Tu rojê leyzekî dileyzî. Geh rast dizivirî û geh jî çep. Gava ko tu rast dizivirî, hemû tişt rêk û pêkin. Her kes li ser kar û barên xwe û her tişt li ciyên xwe da rêkin. Lê Yezdan neke ko tu bi kesekî ra bikevî înk û kînê. Gava ko tu bi kesekî ra ketî înkê, giştî kar û barên wî yê rêk jî nerêk dibin. Giştî dost û heval û hogirên wî yên cancanî jî jê ra dibin dijminê xûnî û bavkuştî. Hingivînê destê wî belengazî dê jehriya marê serkesk derkeve. Penêrê li ber piyên hespê wî bibe kevir û sorgulê jê ra bibe dirka jehravî û bilbilên di baxçê wî da, yê bibin kundê korî bê wayîk.

Cîhana derewîn e. Pîra mirovixor û xortxapîne. Ta roja îro kesî nekariye, dûl û bayên wê rast bike. Ta roja îro çî kesî razên wê yên sergirtî ser venekiriye.

Erê kê dizanî? Çi kes nizanê kanê sibê dê çiyê bê serê wî. Em ko hemû

tiştên nerêk davêjin ustuyê vê çerxa çepger, lê ya rastî ev çerxa pîr  
û  
hevderketî jî qet nizane kanê kê wê dizivirîne. Kê çerxa wê  
diçerixîne.  
Qet ew jî nizane kanê sibê dê çi yê bê serê wê bixwe jî. Gelo ewê  
heta het-  
ayî bizivire, yan hema hindik maye ko ew jî li ser teberê bişiqite û li  
nav  
keyhana bê bin da jev below bibe û bibijiqe û pirtikên wê li hewayaya  
be bin  
da bibin toz û gemar? Erê cîhan e! Kes nizane, ka li pişt perdê da kê  
heye?  
Çi heye û çi tune? Dibêjin çerxa felekê ye, ko Siwaran peya dike  
û  
peyayan siwar. Mîr û mîrizadan dike şivan. Dîsan şivanan dike mîr.  
Kes  
tişteke ji karê vê cîhanê nizane. Diqewime, tu ko niha li wêderê  
rawest-  
ayî, sibê qeziyayek wisan bê serê te, ko te li ser textê padişatiya te  
bavêjin  
û teyî li nava deriyaya xweşî û heyê da noqimbûyî, bikin golikvanê  
guhên  
gundan. Diqewime te bi golikvanî jî nepejirînin. Lew ra ko tuyî mîr  
û  
mîrizade golika beş û ya dêlbaz ji hevdu nanasî. Xelik şêt nebûne,  
ko go-  
likên xwe têkin ber te. Herçend ko tu pir zana û jêhatî bî jî, bilanê.  
Ew

## 100 BILÎCAN

yeke li destê te da ko nîne. Pêşyan gotine: »Jêhatbûnê nîne,  
lêhatbûnê  
ye.« Yan berewajî wê, teyî golikvan, ko tu ji golikan pêve çî tiştî  
nanasî,  
bikin şah û padişahê welatên pan û berîn. Bi mîlyonan civata  
çavgirêdayî  
bêy wê hindê, ko bizanibin tu kî yî û çî yî, serê xwe ji te ra bitewînin  
û li  
jêr fermana te da bin. Bêy wê hindê ko te binasin, gultegulte herin  
xwe ji  
bona yek gotina te bidin kuştinê. Zaroyên xwe ji te ra gorî bikin.  
Çunku  
çerxa felekê li wê demê da li ser bayê te dizivire. Lê wakî çerxa  
felekê li ser  
bayê te nezivire, pişîka te ya nêçîrvan dê diz û seyê te yê gurêx dê  
arode  
derkeve.  
Erê cîhan e! Tu çî dizanî, tu ko şev û roj dixebitî. Bi maran ra qalik  
davêjî, çî yê bibe destvehata te? Tu çî dizanî kî yê keda destên te  
bixor? Te  
hew dît ko tu ne ji gav da ji tik û pik ketî û malê te, ew malê ko te bi  
hezar  
û yek êş û cenceratê berev kiriye, li ber çavên te xêz û vêz û suxt û  
puxt  
bikin...«  
Silêman li van hizirane da bû, ko Werdekê bang lê kir:

»Hero Silêmano! Te xêre tu wisan kûr diponijî? Gemiyên te di oqyanosan da noqim bûne?»

Silêmanî, te digot qay li xeweke kûr radibe, keserek rahêla û got:

»Qet, hema wisan.«

— Na, na bêje ka çî li dilê te ra derbas dibû!

— Herê Werdekê, ez li bara kar û barên cîhanê da, li bara gera vê fele-

ka çepger da dihizirîm. Ev feleka pîr, mîr û mîrzadan dike şivan.

Şivanan

dîsan dike berdevkê mîr û padişahan. Kes nizane ka ev feleka pîr dixwaze

çî bike.

— De rabe! Min jî got, ka tu li çî bareyê da dihizirî, lo!

— Ne, her hind. Ez her li wê barê da, li bara leyza hezar renga felekê da

dihizirîm.

Li van got û bêjana da bûn, ko Mîroyê kurê Mela Heseni, birazavayê

Silêmanî, bi gulşayî hate ber derê xîveta wan. Hê qisê nekirî,

Silêmanî

gazî kirê:

— Mîro ca were jor!

— Ez jî hema vaye tîm.

Îca Mîro bi gotina xwe ra kete hundurê xîvetê. Silêman yek bi bejna

xwe va li ber va rabû. Herduyan destên xwe dane hev û hevdu

himêz

kirin. Li dû ra Mîro silav li Werdekê jî kir. Tev li ser tatikan rûniştin.

Li

dû serçavanî û xoşbêjîyê ra Mîro weha pîrozbayî li Silêman û Werdekê

kir:

101

BILÎCAN

— Pîroz be Silêman! Çavên te ronahî Werdek!

— Zor sipas Mîroyê xoşdevî!

— Bijî Mîrîoyê delal! Qet li dîwanxanê çî heye?

— Xweşiya te. Hemîn niha mamê Hesêyi bi hûrgilî ji te ra şirove kiriye.

Îro piştî firavînê rê û şûna helbijartina serekpehlewaniyê ye. Mamê Hesê

û Mîrî biriyar girtine, te bikin serekpehewan. Mîrî şandiye ji te ra destek

cil û bergên pehlewaniyê ji Helebê înanê. Îca ez hatim min got ka te karê

xwe kiriye, em tev herin dîwanxanê.

Bi bihîstina van xeberana ra dilê Silêmanî weke cûncikekê li qefesa sîngê wî da perper lêda. Silêmanî ciyê xwe xoş kir û got:

»Erê zor sipas! Mamê Hesêyi şeva dî gote min.«

— Îca eger tu li ser karê xwe bî, rabe em tev herin. Niha Mîr bi koma ridênsipî û pehewan û giregiran va li dîwanxanê da li bendî tene.

Fermo

em herin. Xwe gîro neke!

— A, ez amade me.

— Dey fermo!



Herduk tev rabûn. Xatirê xwe ji Werdekê xwestin û ji xîvetê derketin.

Werdek jî ta ber derê Xîvetê di gel wan hat. Silêmanî li pişt xwe ra li

Werdekê nihêrî. Werdek pê ra keniya. Ewî jî bi bişirîneke şirîn bersiva

lêvkena Werdekê da. Ta ko Mîro û Silêman çûn ketin hundurê dîwanx-

anê jî, Werdek hema wisan li ber derê xîvetê rawestabû û li bejin û bala

Silêmanî, li rêveçûna wî, li havîtina pêngavên wî dinihêrî. Gava ko ewan

li ber çavên wê wenda bûn, zivirî xîveta xwe. Dilê wê dikire tirpetirp.

Dengê tirpetirpa dilê xwe bi başî dibihîst. Bi gulşayî xwe deverû avîte ser

palgî. Rûmetê wê kete ser xabê mexmerê rûyê palgî. Rûmetê xwe lê sût.

Xoşina wê lê hat. Seha xweşî û gulşatiyê li giştî leşê wê geriya. Dîwanxane

û koma pehlewan û giregiran anî ber çavên xwe. Ew giregirên ko dixwest-

in ewê bi zora zêran ji bavê wê bixwazin. Ew pehlewanên ko li evîn û

xwazîka wê da dişewitîn, lê li ber mercê wê newêrîbûn derê sendoqa dilê

xwe yê wargehê derd û kulan vekin.

Silêman û Mîro tev daketin hundurê xîveta dîwanxanê. Gava ko çûne

gorê, Silêman li ber deri rawesta û destê xwe da sîngê xwe û silav li komelê

kir. Hemûyê tev silava wî vegirtin. Ji nivê komelê zêdetir li ber wî va rabûn. Mîr Elî Siwaran jî bixwe ji ciyê xwe hilqedimî û bi dest cî nîşanî

Silêmanî da. Silêman di gavekê da li ber şerman soromoro bû. Lê zû xwe

kom kir û destê xwe da sîngê xwe û hema wisan li ber derê xîvetê rawest-

ayî ma. Mîrî dîsan cî nîşanî wî da û vê carê bi dengê bilind, ko rehên

102 BILÎCAN

kêfxweşî û şabûnê têda bi başî diyar dikirin, got:

»Silêman fermo lêre! Fermo! Fermo! A lêre! A lêre!«

Silêmanî nepejirand û got:

»Ezbenî eger destûra we hebe, ezê hema a lêre birûnim.«

Lê Mîrî nepejirand û du, sê caran li ser hev bi dengê bilind gotê:

»A, were lêre! A, were lêre!«

Silêman bi neçarî hema wisan ko destê wî yê rastê li ser sîngê wî bû, ber

bi ciyê ko mîrî nîşanî wî da bû, çû û li serfêza koma pehlewan û xoşmêran, li bintara xezûrê xwe Hesê Dûdêyî da rûnişt. Gava ko Silêman

rûnişt, ew nivê komelê yê mayî jî li ber wî va hilqedimîn. Silêman bi dengê lerizok got:

»Tikayê dikim! Fermon! Fermon!«

Komel her kes li ciyê xwe da rûniştin. Silêmanî li nava çav û birûyan da  
da  
avirekî bikir li komelê gerand. Rêza mêrxas û pehlewana cuda bû.  
Rêza  
ridênsipiyan cuda bû. Rêza giregire û serekhozan cuda bû. Bi dîtina  
vê  
komelê û dîwanxanê ra dîwanxana bavê xwe anî bîra xwe. Baş  
dihate  
bîrê, ko li dîwanxana bavê wî da jî gava ko karekî giring heba,  
giregire û  
mêrxas, ridênsipî û serekhoz, biwêr û pehlewana weha kom dibûn.  
Dîwanxana bavê wî jî çî ji vê dîwanxanê nedima. Lê çî jê hat? Piştî  
miri-  
na bavê wî, piştî wê hindê ko bavê wî li ser zivirandina talanan û li  
ser  
parastina av û axa kal û bavan ji hêrişaya neyaran, hate kuştinê, jêk  
belaw  
bû. Li dû ra careke dî jî cerdê avîte ser talanên wan û dar û nedarên  
wan  
birin. Mîrtî ji destên wan hate derêxistinê û kete destê Emer axayî.  
Emer  
axayî jî her pêş da nexşaya her tiştî kêşaya bû. Ewî berî hînga xûşka xwe  
Xecîc  
avîtibû devê mamê Îsi û bi wê hindê devê Mamê Îsi girêdabû. Ewî  
bi  
arîkariya neyaran pêşbîniya her tiştî kiribû. Li kutayê da jî komela  
durû

berebere ji dora wan revîn û ewan li tunebûnê da tenê hêlan. Lê  
Emer ax-  
ayî karekî dî jî kiribû. Ewî Mamê Îsi kiribû berdevkê xwe, ta ko devê  
hin-  
dek dilsojên mala Mîrî girêbide. Lê radeya dilsojan jî berebere kê  
û  
kêmtir dibû. Erê Sûsê çî baş digot; Her ko kize, mêşan li wir vizeviz  
e. Îca  
li ser hemû kul û derdan ra mamê wî ew kiribû qawegerînê  
dîwanxana  
Emer axayî. Ev serhatiyên tal bînanî perdeyekê li pêş çavên wî ra  
derbas  
bûn.  
Dîsan berêkê da avirek da dîwanxanê û rûniştîyên wê. Ji koma  
pehle-  
wanan û desta giregirên hoz û qebîlan pêve, yên dî hemû keyfxoş  
bûn.  
Tenê koma pehlewan û giregiran, te digot qay xwelî li ser da  
dabêtine.  
Gelek ji wan pehlewan û giregirane li xwazîka destveînana Werdekê  
da

103

BILÎCAN

sotibûn. Lê newêrîbûn, ewê xwazîkê eşkere bikin. Tirsiyabûn. Ji  
daxê tir-  
siyabûn. Lê Silêmanê biwêr û pehlewan mêrmêran e li Werdekê  
bibû xu-

dan. Werdek weke pariyekî çivir ji nav dest û lepên wan deranîbû.  
Bêgotin li nav wan pehlewanana da yên ji Silêmanî zor û zorbetir jî  
hebûn, lê newêrek bûn. Ji ber tirsan newêrîbûn, xwazîka dilê xwe  
eşkere  
bikin. Lê êdî derbas bibû. kuta bibû. Dar ketibû û toz temirîbû.  
Werdek  
giheştibû xudanê xwe. Lê ka ew dilê ko vê hindê bipejirîne. Dil  
wargehê  
vîn û kîneye. Dilê ko kîna kesekê ketê, zor dijwar e ko vîna wî jî di  
wî dilî  
da cîwar bibe. Kombûna du dijberan li ciyekî da ya bûnê nîne. Eger  
kîna  
kesekê di dilekî da cî bû, êdî zor dijwar e, ko vîna wî jî li wî dilî da rê  
ji xwe  
ra peyda bike. Erê kîna Silêmanî ketibû dilê gelekê ji van pehlewan  
û  
giregire û mêrxasana da. Lê ka ew mêrê ko bikaribe deng bike û  
ewê kînê  
eşkere ke. Silêmanî ev hinda baş li çavên wana da dixwend.  
Paşî vexwarina qawê û xwarina firavînê, Mîrî bi dengekî aza gote  
begzadan:  
»Ca li derva miqamekî şad û sivik lêdin, em jî vaye li dû we ra tên.«  
Bi gotina Mîrî ra begzade derketin derva û li ber derê dîwanxanê  
dest  
pê kirin pêş da miqamekî şad û li dû ra jî miqamekî mêranyê lêdan  
û bi  
lêdana miqami ber bi meydana zoranê çûn.

Di gel dengê duhol û zurnayê, Mîrî berê xwe li ser Mela Ehmedi da kir

û gotê:

»Mela Ehmed fermo!«

Mîr û Mela Ehmed tev ji cî rabûn û ketin pêşiya komelê û li dîwanxanê derketin. Li dû wan ra pirtêpirtê kete nav komelê û bi gultetî ji xîvetê

derketin. Bi dengê duhol û zurnayê ra, gultegulte qîz û bûk û jin û zar ji

xîvetan derketin û deste desteber bi meydana zoranê meşîn. Komela mêr

û jin û zaran pêkve giheştin meydana zoranê.

Destek cil û bergên pehlewaniyê li destê Remo pehlewani da bû, ko

ber bi doşika naverasta meydanê dibir. Gava ko Remo pehlewani gihîşte

rex wê doşikê, Mîrî bi wateya bêdengiyê dest li begzadan hejand.

Di gel

fermana Mîrî dengê duhol û zurnayê kerr bû. Li ber axiftin û got û bêja

komelê gimegim ketibû meydanê. Werdekê jî di gel Gulîzera bûka Mîrî

û komek qîz û bûk va xwe dabû serperê koma jinan. Gava ko begzade bê-

deng bûn, carçiyek derkete ser doşika nîveka meydanê û bi du, sê dangan

kire gazî :

»Gelî komelê tikaye bêdeng bin! Mamê Hesê dixwaze biaxive.«

Bi dengê wî ra komel kerr bû. Di wê demê da Mîrî berê xwe li ser Hesê

104 BILÎCAN

Dûdêyî da kir û gotê:

Hesê fermo komelê gelekî çavnihêr nehêle!

Li dû fermana Mîrî ra Hesê çû li ser wê doşikê şipêkî rawesta û weha dest bi axiftinê kir:

»Gelî komela birêz! Gelî ridênsipî û giregirên hêja! Pehlewan û mêrx-

asên biwêr! Gelî jin û porsipiyên êlê! Hûn hemû dizanin û agadarin, ko

ta roja îro me li ber vê ax û avê da, li ber xaka paka nîştimanê xwe da, çi

xizmetên giring kirine. Hûn hemû li giştî qewimîn û serhatiyên me agadarin. Çar nîkarên me dijmin û neyarên çavnebar û çavçinok û xûnxwar in. Ta roja îro bi yarmetî û arîkariya Yezdan û rênimûniya Mîrî

û hevaltî û hevkarî û yêkatiya komela xwe, me çi derfend nedane van ne-

waran. Ne tenê li dirêjaya vê mêjûya ko em pêkve dixebitin, çi kesî newêriye avirekî çep bide nîştimanê me, belkû vê gavê hevhişiyên me

yên başûr û yên rojava bêşa salane jî didine me û em jî wana li himber vê

bêşê da, ji devê diz û gur û zorbêjan diparêzin. Lê her wekî hûn hemû

rewşa min dibînin, ez êdî pîr bûme. Min temenek bihorandiye. Roja  
îro  
êdî gered, gereda genc û lawane, ko evê erka giring dest xwe va  
bigrin û  
rêça me bişopînin. Ez roja îro li vê bereviyê da dixwazim tiştektor  
giring  
bigehînim agadariya we. Bi fermana Mîrî û rêdana ridênsipiyan, ji  
îro  
şûn da ez erka xwe ya serekpehlewntiyê dispêrim zavayê xwe  
Silêmanê  
Eliyê Mîr Silîv Begê...«  
Gava ko navê Silêmanî û bi taybetî navê kal û bavê wî, hate  
ragehand-  
inê, dengedeng kete nav komelê. Bû pistepista wan û li guçkên  
hevdu da  
xeber dan. Mîr xwe kuxand û got:  
»Gelî komelê tikaye bêdeng bin! Bêdeng bin kanê Hesê çi dibêje!«  
Komel li cî da bêdeng bû. Hesê dîsan li dû gotinên xwe ra girt û got:  
»Ez îro li pêş çavên we vê erka giring dispêrim Silêmanî, lê ez  
daxwazê  
ji Silêmanî dikim, ko weke kurdekî dilsoj bixebite û çi gavan li çi hel  
û  
mercan da li beranber vî gelî û vê av û axê da serê wî jî biçe, kêmasî  
û  
xinizî û qelsî û dexesiyê neke. Niha ez daxwazê ji Silêmanî dikim ko  
ji bo  
rê û şûna vergirtina cil û bergên pehlewantiyê û sûnda  
nîştimanperweriyê



çavniherî fermana Mîrî be.»

Bi kutabûna axiftinên Hesêyi ra, komelê li çepikan dan û bû tiple-  
qutanê û jinan tilîlandinê.

Li dû ra Mîr ber bi doşika nîveka meydana zoranê çû. Bi çûyîna Mîrî  
ra dîsan bilmebilma kete nav komelê. Gava ko mîr giheşte ser doşikê,  
hê jî

bilmebilma komelê bû. Mîrî li ser doşikê du, sê caran vî alî û wî alî li  
do-

105

BILÎCAN

ra xwe, li komelê nihêrî. Li dû ra du, sê caran xwe kuxand. Bi  
kuxiyana

Mîrî ra komel bêdeng bû. Mîr bi heyecan bû. Keyfxoş bû. Bi keyfx-  
oşiyêke taybetî dest bi axiftinê kir:

»Gelî hevvelatîno! Gelî komela hêja! Xûşk û birayên birêz! Herwekî  
Hesêyi ragehand, me li ser dîtina giregire û ridênsipiyên gelê xwe,  
Silêmanê Eliyê Mîr Silîv Begê, ko we hemûyan mêranî û  
pehlewantiya

wî dîtîye û hûn bi hêza milê wî hesiyane, bo erka giringe ya  
serekpehle-

wantiyê helbijartî ye. Roja îro em li vê derê berev bûne, ko li ser rê  
û şû-

na kal û bavan, li ser rê û şûna pêşiyên xwe, ew pêşiyên ko bi xûna  
xwe ev

av û axa ji me ra parastine, evê erka giring li pêş çavên we hemûyan  
bis-

pêrin destê Silêmanî. Ji îro şûn da Hesê Dûdêyî, ko temenekî dûr û dirêj

li ber vî gelî û li ber vê av û axê da xizmetên giring kirine, karvenîş dibe û

Silêmanê Silîv li ciyê wî da dibe serekpehlewana. Remoyê pehlewana jî

dîsan dê wekî pêş da, cîgirê serekpehlewana be. Ez li hindav xwe da zor

sipasê ji xizmetdarî û dilsojiya Hesê Dûdêyî dikim û temenekî dûr û dirêj, temenekî bi serferazî û tendurustî jê ra daxwaz dikim. Her wisan ez

vê erka giring pîrozbayî dibêjime Silêmanî û daxwazê ji Silêmanî dikim,

ko bo rê û şûna vepoşîna cil û bergan û sûnda nîştimanperweriyê were ser

serkoyê.«

Bi vê gotina Mîrî ra şîrqîn kete komelê û hemûyê bi hev ra navê Silêmanî anîn û li çepikan dan.

Mîr jî li ser serkoyê peya bû û ber bi ciyê xwe yê pêş da çû.

Bi dengê komelê ra Silêman ber bi serkoyê çû. Remo pehlewana jî hema

wisan cil û bergên serekpehlewaniyê li ser destaye û li rex serkoyê rawes-

ta ye. Gava ko Silêman gihîştê ser serkoyê, dîsan şîrqîn bi komelê ket û

bû Silêman, Silêmana wan û li çepikan dan.

Silêman ko hilkişiyabû ser serkoyê, destên xwe bi wateya sipasbêjiyê ji

komelê ra hejand û berê xwe li ser komelê da kir û destê xwe da sîngê xwe

û serê xwe ji komelê ra xwar kir. Di vê demê da Remo pehlewan jî bi

buxçika kincikan va hilkişiya ser serkoyê. Derê buxçikê vekir. Destek cilkên çerm li nav buxçikê da bû. Remoyi pêş da kurtikê çermîn ji buxçikê deranî û gote Silêmanî kurtikê xwe bêxe. Silêmanî kurtikê xwe

şiqitand. Remoyi bi milê kurtikê çermîn ra girt û Silêmanî milê xwe tê ra

kir, û bixwe bismikên kurtiki ji davê ta binçenê li hev ra derbas kir û li bin

çena xwe da girêda. Bi vergirtina kurtiki ra, komelê li çepikan dan:

— Pîroz be! Sed car pîroz û bimbarek be! Her bijî Silêman!

Li dû ra Remo pehlewanî şapikê çermîn jî da destê Silêmanî. Silêmanî

106 BILÎCAN

şapik jî li xwe kir.

Dîsan qûtîn bi komelê ket:

— Pîroz be! Pîroz be!

Li dû ra Remoyi kembera çermîn da destê Silêmanî. Silêmanî bi hosta-

tiyek tam sermilkê kemberê avîte ser milê xwe û serê wê li azûmê ra der-

bas kir û bi ser û ber li navtenga xwe va qîşt girêda.

Dîsan dengê şayî û pîrozbayiya komelê cergê asîmanan kerr û guçkên

felekê kerr kir.

Li dû ra Silêmanî gîzma çermîn jî, ko Remo pehlewanî danîbû rex wî, rakir û kişande piyên xwe. Gîzme ta bin çokên wî hatin. Komelê bi hev

ra gazî kirin:

— Li ser çavên dijmin û neyaran ra be!

Li dû gîzman ra Remo pehlewanî bi berestûya zirêxê pehlewantiyê ra

girt û Silêmanî milên xwe tê ra kir û Remoyi alî wî kir, ta ko çarbaskên

zirêxi li piş xwe ra li hevdu ra derbas kir.

Dîsan qûtîn bi komelê ket:

— Pîroz be! Sed car bimbarek û pîroz be!

Remoyi kulavqot jî da destê Silêmanî. Silêmanî kulavqot da serê xwe û

çarbaskên wî li bin çena xwe da li hev ra derbas kir. Dîsan jî dengê komelê

bilind bû:

— Pîroz be! Pîroz be!

Li dû ra Remo herdu zendane raberî Silêmanî kirin. Silêman herdu zendane jî kişande zendên xwe û kespikên wan li nav hevdu ra derbas

kirin. Li dû ra Remoyi şûr bi kalani va da destê Silêmanî. Silêmanî şûr jî

ji destên wî stand û kembera kalanê şûri avîte navtenga xwe û li ser newqa

xwe da ediland û şûr li ser kêleka xwe ya çepê va girêda.

Dengê komelê bilind bû:

— Pê serê dijminê bifirînê!

Li dû ra xencer ji destê Remoyi vegirt û li ber kembera xwe ra kir.

Dîsan komelê dane hawaran:

— Pê zikê dijminan bidirînê!

Remoyi mertalê polayîn û nêza çar gezî jî raberî wî girt. Silêmanî ewan

jî ji destê Remoyi vergirt û nêze li destekî û mertal jî li destê dî da şûş li ser

serkoyê li pêşberî komelê gij rawesta.

Komelê dane hawaran:

— Pê cergê neyaran kon konî bikî!

Remo jî hema wisan li bin piya serkoyê li rex wî rawestayê. Bo demeke

107

BILÎCAN

kurt Silêman hema wisan rawestayî ma û li komelê nihêrî. Bi hezaran

kesî, çav kutabûn nav çavên Silêmanî û çavnihêr bûn, kanê Silêmanê çî

bêje. Silêmanî giraniya hezaran çavî li ser leşê xwe da seh kir. Hindik mabû li jêr tirîşkên çavan da biwehimiya. Lê zû xwe berev kir. Tama de-

vê xwe xweş kir. Tûka xwe qurtve kir. Vî alî, wî alî li dor xwe nihêrî û we-

ha dest bi axiftinê kir:

»Mîrê birêz! Pehlewanên hêja! Giregirên giranbuha! Serejin û por-

sipiyên dilovan! Xûşik û birayên xoşewîst! Komela xoşdevî! Ez berî  
her  
tiştî sipasê li Mîr û li xalê Heswêyi dikim, ko ez hêjayî vê erka giring  
dî-  
tim û ev erka sipartin min. Ez îro li ser vê cayêgeha pîroz û li pêşberî  
we  
hevnîştimanên hêja da, gift û erêkirinê dikim, ta roja ko zindî bim,  
bi can  
û dil ji bo parastina welatê xwe û serferaziya gelê xwe têbikoşim. Ez  
li be-  
ranber we û nîştimanê xwe da sûnd dixom, ko çî caran li parastina  
gel û  
nîştimanê xwe li hember hêriş û destdirîjîkirinên neyaran da xinizî,  
qelsî,  
dexesî û kêmasiyan nekim. Ez sûnd dixom bi Yezdan, ko sêrê min  
dê di  
oxîra gel û welatê min da be û hindî ez hebim, ezê li vê erka pîroz  
da, bi  
dil û can ji bo gel û welatê xwe bixebitim û wec û karên gel û welati  
dê li  
ser hemû kar û barên dî ra bigirim. Li kutayê da ez ji Yezdan  
dixwazim,  
ko li vê erka pîroz da arîkariya min bike.«  
Lêre da Silêman bédeng bû. Berî hemûyê Mîrî û li dû wî ra jî komelê  
li  
çepikan dan. Silêman li nav çepikên komelê da li ser serkoyê peya  
bû. Li

dû peyabûna Silêmanî ra, qawegerîn û berdestkan bi fermana Mîrî  
ra  
şîrînî û şerbet û mêwe û çerez li komelê belaw krin. Dîsan bû ringîna  
duhol û zurnayê. Vê carê begzadan li miqamê govendê dan.  
Werdek û  
Gulîzerê bi destên hev ra girtin û daketin gera dîlanê. Qîz û bûk û  
genc û  
lawan dîlan girtin. Govend giran bû. Werdekê serçopiya govendê ra  
girt-  
ibû. Xêliya xwe ya bûkîniyê kiribû destmala serçopiyê û bi hejandina  
xêliyê ra, xwe çep û rast dişkand. Qîz û bûkan li tilîliyan didan. Genc  
û  
lawan difîqandin govendê ta êvarê li meydana zoranê da geriya.

108 BILÎCAN

12

Xebera guleşanêya Silêman û Werdekê, zemawenda wan,  
serekpehlewana-  
tiya Silêmanî bûn dengî û li dû hev ra belavî cîhanê bûn. Hindî ko  
Silêman û Werdek û Hesê Dûdûyi û her heft kurên wî yên pehlewana  
bûne yek, roj bi rojê ji hejmara neyarên Mîr Elî Siwarani kêr û li  
hejmara  
dost û hogirên wî zêde û zêdetir dibûn. Ew çend hozên gerok yên li  
başûra  
welati jî, ko pêşda car û baran bi reşedizî dadiketin kulîna Mîrî û ji  
xwe ra  
çend kût direvandin, ewan jî bi şandina pêşkêşiyên û dayîna bêşên  
salan e,

dositaniya xwe bo Mîrî ragehandin û bi kiriyar jî ew dositanî didane  
diyar  
kirinê. Serokên çend hozên hevhesî û hevkesên Mîr Elî Siwarani  
yên  
rojavayî jî di gel ridensîpiyên xwe hatibûn dîtina Mîrî û gift kiribûn,  
ko li  
hember hêrişên neyaran da, alîkariya kurdan bikin. Her wisan bêşên  
salane bidin Mîrî. Ê li hember vê bêşê da jî Mîr debê, ko wana ji  
hêrişên  
diz û cerde û çeteyan biparêze. Li dû ra jî çend hozên Ereban ji  
beriyê hat-  
ibûn û gihîştibûn mala Mîrî û li navê Mîrî da diman. her li ber wê  
hindê  
bû, ko gelek caran ji Mîrî ra Mîrê ereban jî digotin.  
Mîr Elî Siwaran, herçend ko temenê wî li ser çil û pênc saliyê ra bû,  
lê  
hindî ko Werdek û Silêman zewicîne, roj bi rojê genc û genctir dibû.  
Hindî ko Silêman bûye serekpehlewani, roj bi rojê li karîn û şiyar û  
nav  
û bangê Mîrî zêde û zêdetir dibû. Lê berewajî wî, Ehmed Beg roj bi  
rojê  
pîrtir dihate xûyanê. Serçavên wî qerçimibûn. Hind ponijîbû, ko  
girêyek  
hindî nîskeke nekelok li nîveka herdu birûyên wî da ji xwe ra cî  
vekiribû.  
Mîr gorekî kewneşopên kurdî pir zû zewicîbû, kurê wî yê mezin  
Ehmed



Beg bîst û pênc salî bû. Lê yê nenas we dihizirîn ko ew birayê Mîrî ye.

Ew Ehmed Begê ko mirovî sawa kulê jê dikir, tewiyabû. Ler û lawaz bibû. Daketibû. Tim posîde û bêmede bû. Kêm dihate dîwanxanê. Pir

kêm li ber çavan diket. Zor caran xwe dida goşeyekê û pûşkek dida destê

xwe û erd vedida. Tim û tim li hizrên kûr da bû.

Rojekê dîsan Ehmed Beg weke caran li goşeyekê da dûr ji çavan tik û

tenê rûniştibû û kûr diponijî, ko Remo pehlewana lê derket. Silav lê kir û

gotê:

109

BILÎCAN

»Ehmed Beg bibihorîne, ez pirsekê ji te bikim, tu dilê xwe nakî?«

— Na! Bêje ka tu yê çî bipirsî?

— Van rojana tu çima weha posîdeyî û tim li hizran da yî?

— Qet Remo tu nahêlî xelk ji xwe ra bihizire jî!

— Na ezbenî, wisan nîne. Lê hizirîn heye ta ko hizirîn.

— Yanê çî Remo?

— Ezbenî çend rengên hizirînê hene. Ev hizirîna te rengê wê hindê dide, ko Yezdan nekirî, gîrodariyek ji bo te hatibe pêş. Bi serê Mîrî eger

gîrodariyeke te hebe, ez bi can û mal va li ber te rawesta me.

Giyaneke

min heye, ezê ewî jî li rêka te da bext bikim.

— Na, Remo, zor sipas! Min çi gîrodarî çine ye.

— Tu bi serê Mîrî, tu ji min veneşêre!

— Kuro Remo gîrodariya çi! Mirov debê bîr û hizran bike. Biponije. Nexşan bikişîne. Li bara jiyana xwe û gel û welatê xwe da bihizire.

— A, ezbenî te baş got. Mirov debê nexşan bikişîne.

— Remo nexşa çi?

— Ezbenî nexşa paşerojê, nexşa jînê, ya jinê.

Gava ko Remo pehlewanî ev risteya got, çûr ma li nav çavên Ehmed Begî nihêrî.

Ehmed Begî jî li wî mêze kir. Çavên wan kete nav hev. Ehmed Begî serê

xwe hejand û xwe kenand û jê pirsî:

— Kuro Remo jina çi? Tu ko dizanî ez zewicîme.

— Erê ezbenî, ez dizanim tu zewiciyî. Lê ...

— Lê û çi?

Ehmed Beg û Remo pehlewan li biçûktiyê da, bi hev ra bûn. Di gel hev

mezin bibûn. Hevleyz û hevtemen bûn. Li ser xû û xide û reftar û akarên

hevdu ketibûn. Ya dilên hevdu dizanîn. Nîveka wan pir xweş bû.

Razên

xwe yên sergirtî jî ji hev venediştartin. Her çi heba Ehmed Begî ji Remo

ra digot. Lê vê carê ev raza xwe ji wî vediştart. Hindî Remo kunckolî

dikir

û ew hildikola, hind diçû Ehmed Beg rijdtir dibû. Lê Remoyi dest jê nek-

işand. Her bir û anî û qiseyek li vir û yek li wê dihanî, ta ko xeberan  
ji bin  
zimanê Ehmed Begî bikişîne. Lê Ehmed Begî jî dixwest ko Remo  
bixwe  
wê razê ser veke.

Remoyi dîsan çavên xwe kutan nav çavên Ehmed Begî û gotê:

»Ez nizamim tu çi ra ya rast nabêjî min?«

Ehmed Begî diroda teqla dengê xwe guhest û kûşkê xwe tûre kir û  
got:

»Ezê çi ji te veşêrim Remo!«

110 BILÎCAN

Lê Remo pehlewan baş li ser xû û xideyên wî ketibû. Ewî dizanî, gava  
ko Ehmed Beg bixwaze raza dilê xwe eşkere bike, pêş da xwe hêrs  
dike û

paşê bi yarî û laqirdiyekê nerm û êm dibe û bi êminatî derê sendoqa  
dilê

xwe li ber mirovî vedike. Ev e bû, ko Remoyi êdî dest jê nekişand û  
gotê:

»Ezbenî were ya dilê xwe ji min ra bêje! Were navê wê bêje min!

Were

ka kî li dilê te da ye. Were ji min ra bêje!«

— Tu çi dibêjî Remo? Ez çi serederiyê ji gotinên te nakim.

— Tu baş serederiyê ji gotinên min dikî, lê tu xwe li ser va dibî. Ez  
ya

çavhêşîn dibêjim. Ewa ko şev û roj dilê te li nav hev da digivêşe. Ewa  
ko

te bi dil û can çav berdayê. Ez wê dibêjim.

— Hey lê mala te jî ava bûyî! Tu radizêy erdên kaş, dibînî xewnên şaş

Ya çavhêşîn êdî jina mêrê xwe ye.

— Ez jî dizanim êdî ew ya mêrê xwe ye, lê wekî...

Lê xeber li dêvî da ma. Zimanê wî giran bû. Tûk li hewkê da zuha bû.

Bi zorê karî tûka xwe qurtva bike.

— Lê wekî çi?

— Lê wekî nexşeyek hebe.

— Nexşeyek çawa?

— Ne te bixwe jî hema hêca basa nexşan dikir.

— Diqewime nexşa min tişteke dî be, tu nexşa xwe bêje!

Remoyê pehlewan dengê xwe nizim kir û serê xwe kûşkê xwar kir û xwe

ber bi Ehmed Begî kişand û gotê.

— Were em jê ra telbendekê danin. Gîrekê jê ra venên û ewî li ser rêka

xwe hilînin. Me ko ew li ser rêka xwe hilda, ya çavhêşîn ji te ra, û serekpehlewanî jî ji min ra.

— Gîreke çawa Remo?

— Divê em li ser bihizirin û jê ra gîreke baş venên.

— Ewê ko ez dinasim, nakeve çi gîr û telbendan. her rastî jî mêrik mêrekî çeleng e.

— Telbenda ko ez danim û gîra ko ez venêm, çi çeleng û çabûk nikarin

jê bifilitin.

— De bêje kanê tu yê gîreke çawa jê ra venî?

— Tu bixwe ji min baştir dizanî. Rewşa jiyana sereşivanê mihiyan pir

aloz e. Belengazî komek zarokên wî hene. Nikare baş xudan bike.

Em

gereke arîkariya wî bikin.

— Sereşivanê mihiyan?!

— Erê. Ew jî kerbên wî li Silo vedibin. Tu tenê ji min ra bêje kanê nîve-

111

BILÎCAN

ka we çawa ye?

— Kuro tişteke nîne, çawa te hêca got, emê tişteke li devê wî xin, sim-

bêlê wî çivir kin. Ew nikare li xeberdaniya min derkeve. Îca bêje kanê

emê çawa li gel wî helêxin.

— Vira nabe Beg! Fermo em herin mala me û bi hûrgilî li ser vê dozê biaxivin.

Herdu ji cî rabûn. Bi pêgermok li biniya malan ra ber bi mala Remoyi çûn. Daketin hundurê xîveta Remoyi. Jinka Remoyi ji wan ra qaweyek

amade kir. Li dû qawê ra, Remoyi jinka xwe şande mendêya zozanê Ew û

Ehmed Beg tenê li xîvetê da man.

Ewan ta nêzîkiya rojava ro kirin û pîvan. Berê êvarê bû, ko Ehmed Beg

ji mala Remoyi derket. Vê carê li fêza malan ra derbas bû û bi berhaneya

serlêdana revoyê bi pêgermok ber bi pawana hespan û tewlgeha  
revoyê  
çû.

## 112 BILÎCAN

13

Seretaya havînê bû. Malan li zozanan danîbûn. Pez derbasî mexelê  
aliyê  
nizarî bibû. Rêya mexelî li nîveka zangeke bilind ra, ko herdu aliyên  
wê  
weke kelayan li hindav da hilkişiyabûn, derbas dibû. Ava aşekî li  
nîveka  
wê zangê ra dikişiya. Avê li çiyayên aliyê mexel serekenî digirt û li  
berjêrên zozanê ra bitaw li nava kevir, kuçik û tatan ra derbas dibû,  
ta ko  
digihîşte serê zangê. Li gewiriya zangê ra li bilindayiyeke angorî heft  
heşt  
gezan ra jor da dadikete binê zangê û şurikeke ciwan saz dikir. Ava  
şurikê  
lûle digirt û weke sûleya aşekî bi guj dirijiya binê zangê. Îca li binê  
zangê  
da dirijiya ser tatekî pan û berîn û bi rijiyanê ra çendîn gezan  
dipeşîkiya  
axaran. Paşê li ser tati ra dikişiya û dadikete xwarê û li binê tati da  
lev di-  
geriya û gerînekeke kûr çêdikir. Xuşîna ava şurikê dikete zangê û  
dengê

wê deh beranber bilind û bilindtir dibû. Gava ko mirovî dikete hundurê zangê, te digot qay te pê daniye cîhaneke nû. Nişkêv da dibû xurîna avê.

Deng dikete zangê. Ca gava ko mirovî nêzîkî bi şurikê dikir, deng hindî diçû guj û gujtir dibû. Tu ko digiheştî rex şurikê, te çi tişt ji bilî dengê şurêna avê nedibihîst. Eger li rex te sed top jî agir bikirana te dengê wan nedibihîst. Li seretaya buharê dema ko berfa zozanan diaviya, ev şurika lap dibû şurikeke bi hêz û taw. Ava wê bi guj li pêşîra zangê ra dirijiya binê wê û lev digeriya û kef li ser diket û bi hurmehurm û hurşehurş li binê zangê da berjêr dikişiya. Ev av ta duwemîn meha havînê jî her li ser wê hêz û guja xwe dima. Lê li danê payîzê da ava wê kêr û kêmtir dibû.

Ew dengê ko guçkê felekê li ber kerr dibû, veditexirî. Aveke zirav hindî destekê jê dikişiya. Lê zivistanê dîmena vê şurikê dibû tiştekedî. Ew ava şurikê ko jorda dihat, hema wisan li pêşîra zangê va diqerisî. Îcar rojê destek qeşaya taze lê zêde dibû. Zemzelîlkên gircîgircî û badayî weke şurikan pêva darda dibûn. Ew gerîneka wê ya kûr dibû telteyek qeşaya

şîn. Durust hînga bû, ko zaroyên gundên dewir û ber deste destedihatin,

li ser wê qeşayê xişikanê dileystin. Her yekê ji wan kewneçarixek pê dikirin. Li serê gerînekê durust li binê şurikê ra li ser wê qeşaya teltegirtî

ra ta binê zangê, ew cîhê ko ava şurikê tevî çemê mezin dibû, xwe dişim-

itandin. Dîsan yê biziviriyana û ser ji nû ji binê zangê ra ta lêvara çemî

xwe bişimitandana. Gelek caran zaro wisan li binê wê zangê da berev

113

BILÎCAN

dibûn, ko li ber zaroyan binê zangê weke mozelanekê lê dihat. Vêca gelek

caran her li ser gereda xişikanê zaroyan li hev didan û golên xûnê li ber

hevdu dimeyandin. Vêca li ser şerê zaroyan mezinan jî li hev didan.

Gelek caran her li ser vê geredê du hozên giran li ber hev vedipelişîn û

şerekî dujwar diqewimî. Her li ber vê hindê navê wê zangê kiribûn zan-

ga xûnê. Lê ji çepa wê ra çepa bexlecî digotin.

Rêya mexel li rex wê avê ra dest pê dibû û li gewiriya zangê ya aliyê nizarî ra ko serhevraz ketibû ber bi çiyayê hildikişiya. Ew ciyê ko zangê



dixwest kuta bibe, durust li serê hingivokê, rê wisan teng dibû ko siwarek tenê dikarî tê ra derbas biba. Ew dera wisan asê bû, ko eger du siwar li wê çepê da rastî hev bihatana, yek ji wan neçar dibû, peya ba, û rê ji yê dî ra vekira. Li ser vê rêvekirinê, ta roja îro çendik û çend kes hatine kuştinê. Çunkî dema ko du siwar li wê çepê da rastî hev dihatin, ewê li serfêzê dig- ote yê li bintarê tu peya be, ezê derbas bibim. Yê li bintarê jî digotê na ezê çima peya bibim, lawo tu rast dibêjî, tu peya bibe! Eger tu mirovekî rast- go û rêzanî, tu çima peya nabî!? Ca yek ji vî û yek ji yê dî, qisên wan li hev xweş nidihatî û rikêfî ser hevdu dikirin. Eger nêze ba, eger şûr ba, eger xencer ba, dirêjî hevdu dikirin û yekê yê dî dikuşt û simbêlê xwe badida û li ser cendekê wî ra derbas dibû, û bi vî cureyî mêraniya xwe nîşanî komelê dida. Hindek caran jî her herduyan pêkve hêrişî ser hev dikirin û çeka herduyan jî digehîşte hev û herduyan hev dikuştin. Ca were ew hes- pên bêzar û ziman li wê çepê da bê xwedî û xudan diman. Herdu leş jî

diketin serê rê. Ta ko xelk pê dihesiyan û dihatin bi wawîlok û stiranên mêraniyê ew herdu mêrxasên biwêr, ko yek amade nebibû ji yê dî ra serê xwe xwar bike, didane ser darbestan û dibirin disipartin axa sike sar û piş- ta xwe didanê û diçûne malên xwe. Li wê çepê da ta roja îro bi hezaran karwanî hatine şêlandinê. Li wê çepê da du kesan dikarîn karwanekî giran rût û ordiyekê jî bişêlînin. Her tenê pêdivî bû, ko paşî û pêşiyên çepê bigirtana. Êdî ne riya revê hebû, û ne jî dest radibû ko mirov li ber xwe bide. Ca gelek caran jî rêbir û çeteyan li şeweyek dî wec werdigirtin. Rêbiran li danê payîzê da ko xelkên zozanan diçûne karê zivistanê dikirin. Li çiyayê fêza wê çepê da şarge di- girtin. Gava ko karwanî dihatin, diketin hundurê wê zangê, komek ji rê- giran xwe didane serfêzê û koma dî jî xwe didane bintarê û du desteyan jî li jor da vî alî, wî alî pangewêr li ser karwaniyan da girêl dikirin. Her pangewêrek hindî leşê beranekî li serê zangê ra girêl dibûn û li ser kar- waniyan da dibarîn. Îca deng û heraya mirovan û şîhîna hespan û oreora

114 BILÎCAN

gayên barbir, ko bi pangewêran birîndar dibûn, tevî xuşîna avê dibû.

Karwaniyan yan li ber xwe didan û dihatin kuştinê, yan jî bi dayîna bêşa

rê, di gel rêgiran pêk dihatin.

Ehmed Begê Mîrî suwarê komeytê kapreş li binê wê zangê ra li rex wê

avê ra bi taw derbas bû û xwe gîhande gewiriya çepa bexlecî.

Hurmêna

avê jî nedikarî serê wî li nav dêl û bijiyên hespê da derxista. Li wê demê

da Ehmed Beg her tenê li bîra tişteke da bû. Tenê li ser tişteke zor giran

û giring da dihizirî. Gava ko gihîşte serê çepê, dizgîna hespê xwe ragirt.

Serê hespê xwe zivirand û li dû xwe ra li çepê nihêrî. Baş lê hûr bû.

Paşê

dehî komeytê kapreş kir û bi xaran ber bi mexel çû. Şivanan kerrî li serê

girikekî bilind, ko digotinê girê mexelê başokan dabûne mexelê.

Dajo li

çengê pêz rûniştibû bilûra xwe dabû ser lêva xwe û nalîna bilûra wî bû.

Sereşivan jî li ser tatikê şivanî li ber tavê li ser taqa piştê veleziyabû û hema

wisan servekirî xew ra çûbû. Gava ko seyên şivanî dîtin suwarek waye bi

xaran ber bi keriyê tê, bû rewterewta wan û hêriş birin ser Ehmed Begî.

Dajo çawa ko dengê seqan bihîst, li cî hilpekiya û xwe bi Ehmed Begî ra

gîhand û para berda seqan. Seqan rikêfî ser Ehmed Begî û hespê wî dikirin. Ehmed Begî navên seqan îna. Lê seqan vî alî, wî alî rikêfî ser wî

dikirin. Bi dengê seqan û dajo ra sereşivan bi pelepel ji xew hilpekiya û ji

cî rabû û berbirî Ehmed Begî çû. Ewî jî hay li seqan kir. Seqan dûlka xwe

kirin nav lingên xwe û her yek li aliyekî da li talana xwe da ketin.

Sereşivani bi serê hespê Ehmed Begî ra girt. Ehmed Begî gotê:

»Bereket be Kakil!«

— Ay tu li ser çavên min ra hatî, beg!

— Tu raza bûy?

— Na razana çi! Min taze dixwest ez çavên xwe gerim bikim.

Û bi vê gotinê ra bû kuxtekuxta wî. Bi kuxiyane ra xizexiz ji sîngê wî di-

hat. Destê xwe dabû ber devê xwe kuxikê nedihîşt ew xeber bide.

Ehmed

Begî bi laqirdî, lê bi dengê ko setem jê dibarî, gotê:

— Tutûna te kamaşe Kakil?

— Serê te nizanim sirê li min daye, çawa?

Îca bi vê gotinê ra bi zengiya Ehmed Begî ra girt û Ehmed Beg ji

komeytê kapreş peya bû. Gava ko Ehmed Beg peya bû, Kakilî gema hes-

pê wî ra girt û gote dajoyî:

»Were hespê Begî bibe, a... li sirtê hanê ber bi ba tewil bide!«

Lê Ehmed Begî gotê:

— Na, na, hespê tewil nede. Hema li destê xwe da, a... li rex kaniya han

115

BILÎCAN

biçêrîne! Dajo dizgîna hespê ji destê Kakilî vegirt û hesp ber bi kaniyê bir.

Ehmed Beg û Kakil jî ber bi ciyê çarberiyê çûn. Kakilî got: Erê bi serê Mîrî, ez pîs dikuxum beg.

— Na ,na Kakil şev sarin lewra. Te xwe daye sirê. Yekê jî Kakil êdî tu kal bûyî. Ma wisan nîne ?

Îca bi gotina xwe ra kaniya. Kena wî keneke çêkirok û qestîka bû. Îca bi

vê kena xwe ra li nav çavên Kakilî nihêrî.

— Erê Xwedê êdî kalbûnê li min kar kiriye. her rastî jî ka kiyê heval û

hevtemenê min dibin şivan? Rûyê nedariyê reş bibe! Ez çi bikim. Koma

kulfetan ustuyê min xwar kiriye.

— Xudê tu rast dibêjî. Kesekî hevtemenê te nikare şivantiyê bike. Tu jî

gereke xwe li sir û sermayê biparêzî. Êdî dema wê hindêye ko tu li mal da

bimînî û Kinê ji te ra xizmetê bike. Êdî gereke tu şeveder nemînî.

Ev cara yekê bû, ko Ehmed Begî weha li dema Kakilî dipirsî û weha bi

xomalî bi wî ra xeber dida û laqirdî dikir. Kakil li vê rewşa Ehmed Begî û

axiftinên wî yên dilovanane ra kete gumanan û di dilê xwe da got:  
Gurgên kîjan çiyayî mirine ko dilê Ehmed Begî bi min dişewite? Li nav

hizran da çû û got:

— Erê Xwedê Ehmed Beg, dema min û vehisiyanê ye. Lê ez çi bikim nedarî ye. Tu jî ko yarmetiya me nakî!

— Çima, çima ewê jî bibe.

Kakilî nizanî ka yê çawa bibe. Çi serederî ji wê rewşa Ehmed Begî nekir.

Patika xwe xurand û tatikê şivantiyê ko li ser da razabû, ji erdê hilanî û

dakuta û ser ji nû tatik raxist û gote Ehmed Begî:

»Fermo Beg!«

Beg çarmêrkî li ser tatikê şivanî rûnişt û got:

»Ê... Kakil te got ko em arîkariya te nakin!«

— Na, na ezbenî min yarî kir. Me çi hebe jî, ji dewlet serê te û Mîriye.

Xudê bila me ji te û Mîrî ra gorî bike!

— Herê Kakil ev dajoyê te çawa ye?

— Kurekî aram û li bera xwe da ye.

— Ew jî naxwaze bibe serekpehewan?!

Îca bi vê pirsê xwe ra bi tirane kenîya.

— Ew jî li siya serê te û Mîrî da ye, ko şivanên we jî dibin mêrxas û pehewan.

— Herê rastî nîveka te û Silo çawa bû?

Vêca gava ko navê Siloyî anî, didanên xwe lê çîrikand.

Kakilî zanî ko tiştê heye û li derfendê wec vergirt û got:

— Silo? Ew êdî nabêje ez Silo me. Ew êdî serekpehlewani û zavayê serekpehlewani û mêrê pehlewani ye.

Ew jî weke Ehmed Begî li navê Siloyi keniya.

Li vê demê da Ehmed Begî kûşkê xwe xûz kir û dengê xwe nizimand û

gote Kakilî:

— Erê Kakil, karekî min ketiye aliyê te.

Kakil bi zendeman lê nihêrî û got:

»Ezbenî, ez li xizmeta te dame. Tu bêje ez zaroyên xwe li ber lingê te û

Mîrî da ser jê bikim.«

Kakil bi van teklîfên xwe ra guhên xwe mûç û çavên xwe zil kirin û li nav çavên Begî nihêrî.

Ehmed Begî tûka xwe daqurtand û got:

— Lê divê ko çî kes pê nizanibe ha!

Kakilî bi saw û sosret pirsî: .

— Çiye ezbenî?

— Siloyi...

Lê nikarî gotina xwe bidomanda. Di gel anîna navê Siloyi dest avîte berîka xwe û kîsîkek zêr deranî û danî ber Kakilî û gotê:

— Hanê hilde û saleke dî êdî nebe şivan!

Kakilî kîskê zêran hilanî û li destê xwe da hilteqiland û bi wateyek pir-

siyarane li nav çavên Begî nihêrî.

Beg gotê:

— Serê Siloyî giraniyê li leşê wî dike.

Kakilî kîsik li jêr qerpalên xwe da veşart û pirsî:

— Ezbenî çî kar ji destên min tê?

— Gelek kar ji destên te tên, Kakil.

Ehmed Begî kûşkê xwe li ser tatiki ber bi Kakilî şiqitand û herdu nêzîkî

hev bûn û bi hûrgilî bi hev ra ketin gift û goyê. Dajo ji dûrva tenê hej û

livên wan û destên wan didît.

Êdî gift û goya wan kuta bibû. Ehmed Beg rabû şipê. Kakilî gazî dajoyî

kir:

Kuro hespê Begî bîne!

Dajo hespê Begî anî. Kakilî li zengiya Begî ra girt û Beg li komeytê kapreş siwar bû û xatirê xwe ji wan xwest û dîsan ber bi çepa Bexlecî û

Zanga Xûnê kudand.

117

BILÎCAN

14

Baranên havînî yên ser û binê hîvê, li zozanan da baranên pir bi guj û pir

buvedar û bi nav û deng in. Ev baranan gava ko dest pê dikin, rojekê û

du rojan nadomînin, belkû heftiyekê û heylo du heftiyan jî dikişînin.

Ca



gava ko ev baranana dest pê dikin, tu dibêjî qay erd û esman pêkve  
li de-  
riyayeke reşe bêbinî da cûm kirine. Baran hemû rojê li berbanga  
sibê ra  
dest pê dike û ta nivê şevê didomîne. Li berbanga sibetirê ra dîsan  
ser ji  
nû dest pê dibe. Ca tu dibêjî qay nîveka esmanî kon bûye û av weke  
lû-  
likên lûlehengan jor da diriye. Vêca cîhana zozanan li tofana Nûhi da  
no-  
qim dibe. Ca gelek caran eger hewa sar bibe, baran dibe teyrok û  
her libek  
teyrokê wekî hêkeke kotiran jor da tîn. Li berojan lêvî û lêmişt ber  
bi  
geliyan dikişin. Avên çeman radibin. Eger ew barana ser û binê hîvê  
piştî  
pezbirê dest pê bike, rewşa terşdaran pir aloz dibe. Layekî gur û diz  
derdikevin û layê dî jî pez li ber serma û teyrok û şiliyê diqefilin. Li  
şevên  
weha da lot lota gurgan û kêf kêfa dizane. Pêşiyên gotine: Gurg  
dûmanê  
û reşediz jî şeverişan xweş divên.  
Êla Mîr Elî Siwarani li çendîn zomeyên biçûk û mezin da li zozanan  
da  
danîbûn. Her zomeyekê li panvkekê da, li rex kanî û cobarekê, li  
pêsîra  
girik û berpalekê, li pesêva topikekê da danîbûn. Zoma Mîr Elî  
Siwarani

jî weke her sal li wargê gola hevirmûşi li textana bintara berezîvan  
li rex  
kaniya sarincê da danîbûn. Xîvet û konan li ber baranê lêvên xwe  
dax-  
istibûn.  
Şevereşên ser û binê hîvê di gel barana havînê ya zozanan dest pê  
kiribû.  
Ew heftiyek bû, ko baran şev û roj li ser hev û bê nawe dibarî. Avên  
çe-  
man rabibûn. Li ber ava baranê li her dol û newalekê çemek av  
dikişiya.  
Avên dol û newalan tevî hev bibûn û ber û best dabûne ber xwe û  
giştî rêk  
û şiverêkên ko weke şahdemaran gund û zome bi hev ve girêdidan  
li jêr  
avê û qurê da hêlabûn. Hat û çû ji vê zomê bo zomeya han, ji vî  
gundî bo  
gundê han, heylo ji vê malê bo mala han, bibû karekî pir dijwar. Binê  
çar-  
ixan li ser heriyê dişimitîn. Mirov nikarî baş bi rêve here. Li gelek  
ciyan  
da lingên mirovî ta gîzekan li qurê da çik dibû. Terşdar pir şepirze  
bibûn.

## 118 BİLÎCAN

Rewşa ajal û sexelan pir aloz bû. Şivanan rojê çend cendek û çend  
berate  
dihanîn. Yên ko li ber tîpiyê qefilîbûn, yê ko gurgan bilaw kiribûn.

Baranê li sibêdê da dabûyê û ta serşîvan domandibû. Rast bû ko  
baranê  
taze vekiribû, lê hewa her wisan ewrayî û bi mij û moran bû.  
Şevereşa  
paşnîxtê perda reşe tarî kişandibû ser çavên erdê. Şevereşeke wisan  
bû, ko  
te tiliya xwe li çavên hevalê xwe ra bikira, hevalê te tu nedidît.  
Birqetaveke wisan bû, ko mirovî li ber piyên xwe nedidît. Çavan çav  
ne-  
didîtin. Te digot qay erd û esman bi tayên reş bi hev va hatine  
dirûnê.  
Cîhan bibû deriyayeke reşe tarî. Heyî û neyên li ser rûbarê vê cîhanê  
li  
reşatiya şeva bi ba û baran da noqim bibû. Şev wekî rûyê reşe  
reşkaran lê  
hatibû. Cîhan wisan reş û tarî bibû, te digot qay çerxa felekê bi  
gunehekî  
giran rûyê xwe reş kiriye. Erê pêşîyan gotine: Xudê şev da ji dilê dizî  
ra. Li  
şevên weha da cîran hay ji cîranan nabe. Ji şevên weha reş û tarî ra  
şûrê  
Xudê dibêin. Li şevên weha reş û tarî da kêmkî kes ji malên xwe  
derdikevin.  
Şevên weha ra şevên xûndaran dibêjin. Lê şevên weha ji bedkar û  
xûn-  
daran ra bext û hate. Ji bo şeveke weha Xudê Xudê ya şevger û  
reşedizan

e. Te digot qay giştî reşatiya cîhanê li vê şevê da berevî ser hev bibûn  
û  
hêriştî ser êla Mîr Elî Siwarani kiribûn. Şevê cîhan li xwe da wenda  
kiribûn.  
Cîhan qîrbaran kiribûn. Lê ew hemû reşatiya wa tund û bi hêz, ew  
hemû  
reşatiya çir nikarî ew ronahiyên zer, ko li ber şemalkên kon û xîvetan  
diçirûsîn, wenda bikira. Mom û şemalkên malan li tariya şevê da  
weke  
çavên gurgan diteyîsîn; keriyê Kakilê sereşivani li reşatiya şevê da  
cûm  
bibûn. Demeke dûr û dirêj bû, ko Ehmed Beg û Remo pehlewan û  
Kakilê  
sereşivan şeveke weha çavra dikirin û li xazîka şeveke weha da  
rojhejmêrî  
dikirin.  
Kakilê bangê dajoyan dikir:  
»Lo lo! Li ser hemdê xwe bin ha! Îşev şeva reşedizan e. Li şevên  
weha da  
diz dikarin xwe li pişt mirovî da jî veşêrin. Dikarin xwe bidin bin  
çengê  
mirovî û bi navê hevalekî mirovi, bi mirovî ra bipeyvin. her pêdiviye,  
ko  
ew diza kûşkê kirarî be û bikare dengê xwe weke dangê hevalê  
mirovî  
derîne. Bînanî hevalê mirovî xeber bide. Êdî tu ko rengê wî nabînî.  
Tenê

denge, ko li ber guçkên te dikeve û tu we dizanî, ko ew dizê kirarî  
hevalê  
te ye. Rojên bi dûman rojên gurgane û şevereşên bi ba û baran jî  
şevên  
reşedizan e. Li rojên bi dûman da gurg dikarin xwe li ber pesêva  
bişkulekê  
veşêrin. Li şevên weha reş da jî diz dikarin her di gel te, bi navê  
hevalekî  
te kerrî hevraz û berjêr bikin...«  
Kakil ev gotinane ji şivanan ra şirove dikir, ko seyekî şivanî her  
carekê

119

BILÎCAN

tenê kire rewîn. Kakil li vê derfendê wec vergirt û bangî dajoyan  
kir:

»Kuro zû hawariyê bidin êlê cerdê kerrî bir.«

Bi gotina Kakilî ra bû çirpîna dajoyekî û li nav keriyê derket û ber bi  
êlê

helat. Çavên wî hîmî tarîtiyê bibûn. Wisan direvî, te digot qay bayê  
bezêye. Du, sê caran lingên wî li qolên gwîniyan û li koç û beran asê  
bû

û li ser kele li erdê ket. Li erdê gulomilo bû, teqil veda û dîsan ji cî  
rabû.

Li wê şevereşê û li wê dema hawariyê da kê agah ji êş û birînan dibe.  
Her cara ko diket, bi lez ji cî radibû û dîsan dibezî. Piştî du, sê hels û  
kew-

tan bi helkehelk xwe bi serê girê fêza Zanga Xûnê ra gîhand û gazî kir:

»Hay... dizan pez bir ha... dizan ... dizan, dizan ... pez bir h....a.....y...  
cerdê avêtiye ser keriyê h....a.....y...«

Zomeyên êla Mîr Elî Siwarani, her yek bînanî esmanekî pir stêr li dûr va dihatin xûyanê. Bi dengê hawariyê ra zûrîn bi seyên zoma Mîr ket.

Mêrên zomê ji konan derketin û gazî kirin û pirsîn :

- Hero ew çawa denge!?
- Kuro ew çawa sedaye?
- Hero ca nehêle se bizûrin, kanê ew çawa seda ye?
- Ca paydosî wan segane bikin!
- Kute kute!
- Kire! Kire!
- Talano ca bêdeng be!
- Kuro ca wan segane bêdeng bikin lo!

Li demekê da seqan xwe kir kirin. Deng vê carê lap bi sanahî û bi zip û

zelaî dihate bihîstinê:

— H...a...y... dizan pez bir ... hay cerdê avêtiye ser keriyê hay... hay zû

bikin h...a...y...

Pirtêpirtê kete nav êlê û bû hawarî:

- Dibêjin cerdê avêtiye ser keriyê..
- Kuro zû bikin hespan zîn bikin!
- Xwe tev girêdin!
- Ha zû bikin, ha!

Mîr bixwe derkete ber devê xîvetê û gazî kir:

»Kuro bêjin pehlewana bila xwe tev girêdin. Zû bikin xwe bi wan reşedizana ra bigehînin! Ez ji we divêm, ko hûn wan ji mi ra dîl bigirin û

bînin. Em debê bizanin kanê ev reşedizana kî ne? Bi fermana kê hatine,

dixwazin lekeyan li me bidin?»

Gotegot û gazegazê êl dabû ber xwe. Kesî dengê kesî nedibihîst.

Komel

120 BILÎCAN

ser hev û ber hev ra dihatin û dihelatin. Yê ko hespên xwe zîn dikirin.

Yê ko çekên xwe girêdidan.

He taze hawarî daketibû, ko bû çirpeçirpa siwar û peyayan û ji nav êlê

derketin û li reşatiya şevê da gum bûn. Norenora hespan û fîrefîra kihêlan

û gazî û qûtîna mêran bû. Repetepa lingên peyayan û girmegirma lingên

mehnegiyan tevî hev bûn. Her kes li hindavî xwe da, yê siwarî, yê pey-

atî ji zomê derdiketin û diçûne hawariyê.

Bi yekimîn gaziya hawariyê ra Silêman bêy pelepêl û li ser hemdê xwe

rabû. Cil û bergên xwe yê pehlewaniyê bo cara yekê piştî helbijartina

serekpehlewaniyê li xwe kir. Zirêxê xwe avête ber pêsîra xwe.

Werdek jî

hate bal û alî wî çarbaskên zirêxi li pişt wî da li hev ra derbas kir.  
Silêmanî  
kulavqotê xwe da serê xwe. Şûrê xwe li kembera xwe va girêda.  
Xencera  
xwe li ber piştta xwe ra kir. Nêza xwe ya çargezî rakir. Serê nêzê çar  
tilîkan  
li jahrê ra kir. Ta Silêmanî çekên xwe girêda, Werdekê mahîna wî ya  
seglavî ko Hesê pêşkêşî zavayê xwe kiribû, bi zîn û pûsadan va li ber  
derê  
xîvetê amade kir. Silêman çû alî û pêkve bergustuwan avîtin pêsîra  
seglaviyê. Werdekê zengiya Silêmanî dagirt û Silêman lingê xwe kire  
zengiyê û li ser piştta seglaviyê ket û xatirê xwe ji Werdekê xwest û  
tajank  
li ser seglaviyê da hejand û ber bi hawariyê rê ket.  
Hesê Dûdêyî li dû Silêmanî ra gazî kir:  
»Silêman hêdî bajo, ta ko zaro jî bi te ra giheştin.«  
Lê taze seglavî li rê ketibû û her di gavê da li reşatiya şevê da li ber  
çavan  
wenda bû. Her şeş kurên Hesê Dûdêyî jî dane dû Silêmanî. Lê  
seglaviyê  
mêjve bû, ko siwarê xwe li reşatiya şevê da li ber çavên zarên Hesê  
Dûdêyî  
wenda kiribû.  
Hesê destê kurê xwe yê biçûk ra girt û ber bi mala mîrî çû. Ew û Mîr  
û  
Mela Ehmed û çend ridênsipî û kalemêr li xîveta Mîrî da rûniştin û  
çavnihêrî akama hawariyê bûn.



Jin û zaro hemû li ber derê xîvetan komkomî bibûn û ser û guhên wan  
li ser hawariyê bû. Li her alî li ber derê konan agir hate hilkirinê.  
Nava  
zomê li ber guriyên agiri weke rojê ronahî bibû. Jinan li dora agiri helbo-  
qe girtibûn. Zarû jî destedesteyî bibûn û li ber ronahiya agiri leyza pezkoguro û cerdanê dileystin.  
Ehmed Beg her tim li şevên hawarî û gaziyan da li Şepala şînboz siwar  
dibû. Şepal mahîneke şînboze erebî bû. Rengê kirasê wê te digot pîroze  
ye. Şînekî vekirî û birqonekî, gava ko meyteran ew tûmar dikirin, kirasê  
wê rewneq diketê. Ehmed Begî li nav giştî hesp û kehlanan da keyf bi wê

121

BILÎCAN

mehnegê dihat. Heftiyê carekê bixwe li ser meyteran ra radiwesta, û  
Şepala şînboz dida şal kirinê. Meyteran wisan ew baş û xawên xudan  
dikirin, te digot bûkeke xemilandî ye. Gava ko meyteran ew ji Ehmed  
Begî ra zîn û pûsad dikirin, û berî wê hindê ko Ehmed beg lê siwar bibe,

Ehmed Begî destmala xwe ya çiftexas ji berîka xwe derdixist û destmal li pişta guçkên wê disût, eger kûşkê rengê destmalê bihata guhorînê, yan lekeyekê bi destmalê va bigirta, taze ew meytera ji hemû mafên meyter-tiyê bê pişik dibû qet, lê gelek caran jî eger Mîr li mal neba, hutikeke bi don jî ji destên Ehmed Begî noşî giyan dikir. Ehmed Begî digot li şevên gazî û hawariyan da hespên nêr bi bêhna mahînan ra dişîhin û diz û cerde û dijmin hem zû mirovî nas dikin. Hem jî zû dizanin ka mirov li kî aliye û dixwaze li kî alî da here. Lewra ew tim li hawarî û gaziyan da li Şepala Şînboz siwar dibû. Bi dengê hawariyê ra sê siwaran berî hemûyan xwe gîhandibûne çepa Bexlecî. Fîrefîra difinên mehnegiyên wan bû. Li zangê ra li rex şurikê ra derbas bûn û xwe gîhandin Kevirê Hirçê, Çepa Bexlecî. Ehmed Beg li binê zangê da şarge girt û Remo pehlewan û Mihoyê berdestik jî xwe dane devê neqeba çepê û li ber pesêva hingivoka li pişt Kevirê Hirçê da kemîn girtin. Ewan taze şarge digirtin, ko siwarekî tenê berî hemû

Siwaran dakete nîveka zangê. Dengê şingeşinga zirêxê wî tevî  
dengê  
şurikê bû. Kemîndaran hejyare dane hevdu, ko nêçîr hat. Durust  
gava  
ko ew siwarê tenê kete zanboqê û dixwest li ser hingivoka çepa  
Bexlecî  
bikeve, para û pêra kete ber hêrişan. Ewanê pêşiyê xirên bi zirêxê  
wî  
xistin. Derbên wan li zirêxî asê dibû û li ser wan da dizivîrî. Lê ewê  
para  
pîs fesal ji zirêxdarî standibû. Her li dû hev ra derb li ser derbê li  
navmîla  
zirêxdarî dihejmart. Zirêxdarî nêza çargezî carê dirêjî sîngê yekê  
dikir.  
Şîhîna hespan û hîrîna mehnegîyan tevî nalenala mêran û  
hurşehurşa  
şurikê bibûn. Du siwarên pêşiyê li ser piştta hespan ketin erdê.  
Zirêxdarî  
û ewê ko pişt li wî standibû, serê sernêzan li hev asê kirin, piştî  
demeke  
kin ew herdûk jî her pêkve li ser xanê zînan jor da hatin.  
Mahîna seglavî û sê hesp û kehlanên dî, bêy siwar li ser zomê da  
zivirîn.  
Hawarî ber bi guhera pezî diçû, ko li zanboqa Kevirê Hirçê da rastî  
sos-  
reteke giran hatin. Çend term ketibûn serê rê. Bi qûtîna Elo Xerdele  
ra,

hawaî li ser terman berev bû. Li tariyê da term nedinasîn. Du term  
li  
binê Kevirê Hirçê û du termên dî jî li pişt Kevirê Hirçê da, li ser hevdu  
da ketibûn. Siwar û peya li ser terman berev bûn. Kevirheste û pîşo  
li  
berîkên xwe deranîn û li ber ronahiya agirê pîşoyan li terman  
nihêrîn.

## 122 BILÎCAN

Berî hemûyê termên Silêmanî û Ehmed Begî ko li rex hev ketibûn  
serê  
rê, nasîn. Li dû ra termên Remo pehewan û Mihoyê berdestik jî nas  
kirin. Bû wêlewêla siwar û peyayan. Desteyek ber bi keriyî çûn û  
desta  
dinê jî bo her termî çend nêze bi hev ve girêdan û darbest çêkirin û  
term  
danîne ser darbestan û bi wawîlok û şîn û girîn li ser zomê da zivirîn.  
Werdek li nava koma jin û qîzan da, nehecimtî vî alî, wî alî pêgermok  
digerand. Guçkên wê li ser akama hawariyê bû, ko şîhîna seglaviya  
Silêmanî ew veciniqand. Seglaviya Silêmanî bêy siwar li ser êlê da  
zivirîbû. Gava ko seglaviyê Werdek dît, careke dî şîhiya. Werdekê  
dizgî-  
na wê ra girt û ew ber bi devê xîvetê anî û vî alî, wî alî li zîn û pûsadê  
wê  
nihêrî. Bi şîhîna seglaviyê ra zaroyan dest ji leyza xwe kişandin û ber  
bi wê  
hatin. Jin û zar hemû li dora seglaviyê berev bûn. Werdekê destên  
xwe li

bijiyên wê gerand. Destên wê ter bûn. Bi dengekî ko rehên tirsê jê diyar

bû, bangî dayîka xwe kir:

»Dadê dêranê! seglaviya Silêmanî bêy siwar ziviriye... Ca were kanê!

Dadê !..«

Bi dengê Werdekê ra zarên mala Mîr û Hesê Dûdêyî Kewê, Gulav Xatûn, Gulîzer bi koma kalemêr û ridênsipiyên va li hawariya Werdekê

da hatin. Hesê bixwe mom li desti da berê hemûyan xwe bi Werdekê ra

gîhand:

»Çî ye Werdek? Çi bûye?«

— Bavo seglaviya Silêmanî bêy siwar ziviriye.

— Seglaviya Silêmanî!?

— Way la çavên dayîka te rijiyayê!

Eva dengê dayîka Werdekê bû. Mom anîn û li ber momê li seglaviya Silêmanî nihêrîn. Bijiyên seglaviyê, qaş û terkiya zînê wê li xûnê da mabû. Gava ko Werdekê ew xûna dît, bi lez pê xwe kire zengiyê

û li seglaviya Silêmanî siwar bû û berê xwe da hawariyê. Hesê Dûdêyî li

dû ra gazî kirê:

»Kiça min hêdî bajo ta ko ez jî bi te ra giheştim.«

Hê qisa Hesêyi li devi da bû, ko Werdek li tariya şevê da gum bû. Li dû

Werdekê ra Hesê Dûdê û çend siwarên dî jî ber bi hawariyê çûn.

Deng û

gaziya nava zomê û hawarî û şîn û girîna siwarên ko termên kuştîyan di-

hanîn tevî hev bûn. Werdek li nîviya rê da rastî siwarên hawariyê hat.

Siwar hemû peya bibûn û çar term danîbûne ser darbestan, digotin û

dilorandin û kor û poşman ber bi zomê dizivîrîn. Gava ko Werdekê ew

dîmena dît. Bêy şîn û girîn zengî li seglaviya Silêmanî da û xwest ber bi

123

BILÎCAN

hawariyê here. Lê mêrên hawariyê xwe avîtin pêşîya Werdekê û gotin:

— Kes nemaye. Hemû revîne, çûne. her hatibûn van xweşmêrên me bikojin û herin. Her ji van xweşmêrane ra tele danîbûn. Hatin ya xwe bi

me kirin û çûn.

— Lê qet kesek ji dijmini nehatiye kuştinê?!

— Eger hatiban kuştinê, me yê termên wan bidîtana.

— Li wê şevereşê da term li kû dihatin dîtinê.

— Bêguman niha hatine kuştinê.

— Eger hatibin kuştinê jî termên xwe revandine.

— Silêman bêy tole namire.

— Bêy gotin niha Silêmanî tola xwe bi destên xwe vekiriye.

— Na, Xudê bi me va reş e.

— Xudê kem her çar pehlewanên me jî bêy tole çûn.

Komelê her yekê xeberek digot. Bi şîn û gazî û wawîlok her çar term  
anîn û li ber derê mala Mîrî li rex hev rêz danîn. Hewa jî berebere  
gewir  
dibû. Mîrî destmal dabû ber çavên xwe û digiriya. Mela Ehmed jî li  
dora  
Mîrî ra dihat û diçû, hindêk tişt bi erebî li ber lêva xwe da dixwend.  
Şînek giran li ser êlê da hatibû. Êla Mîr Elî Siwarani çar mêrxas, çar  
pehlewani û serekpehlewani ji dest dabûn. Hê hewa baş ronahî  
nebibû, ko  
gultegulte siwar û peya ji zomeyên dî li hawariya Mîrî da hatin. Lê  
taze çî  
tişt li kari nedihat. Ne kesî bikujên van çar pehlewani nas dikirin  
û ne  
jî kesî dizanî ka ev cerda cerda kêye, ko weha necamêrane li wê  
şereşê  
da ev sosreta giran anîbûne serê wan, ta ko biçûyana û tola çar  
pehle-  
wanan ji wan vekirana. Hemû kor û poşman wekî pezên gêj li dor  
hevdu  
digeriyan. Gava ko hewa lap baş ronahî bû, Mela Ehmedî ferman da  
mirîşoyan, ko kuştîyan rût bikin û bişon. Mirîşoyan pêş da bi çend  
sel û  
hindêk gul û giyayan çar teneşo rêz li kêleka hevdu da çêkirin û her  
çar  
term rêz danîne ser teneşoyan û paşê çeperek li dora teneşoyan  
vegirtin.  
Berî hemûyê Mîr û Hesê û Mela Ehmedî û li dû wan ra jî komelê  
dîna

xwe dane birînên kuştîyan. Birînên Ehmed Beg û Remo û Mihoyî li pêş  
va li ser sîng û zikên wan bûn. Lê birînên Silêmanî hem li ser sîngê wî bûn  
û hem jî li navmilê bûn. Birînên ser sîngê wî her bîzorê diyar dikirin.  
Lê  
birînên li navmilê devên xwe jev vekiribûn. Ev birînan bi zimanê bêzi-  
manan bi mirovî ra xeber didan. Birîna Silêmanî dûr va gazî dikir, ko  
li  
pişt va, bi dexesî û nemêranî lêdane. Pirtêpirtê kete nava komelê:  
— Birîna wî para va ye.  
— Pêş va pê nikarîne.

#### 124 BILÎCAN

— Bi xinizî û dexesî lêdane.  
— Birîn li piştêye.  
— Li navmilêye.  
— Zirêxi nehêlaye, ko pêş va derbên neyaran li sîngê Silêmanî kar bikin.  
— Dizî va li para va lêdane.

Her yekê tişteke digot.

Jinên êlê li dora Gulavtûn û Gulîzer û Kewê û Werdekê berev bibûn, digotin û digiriyan. Li nav koma jinikan da dengê vê wawîlokê li ser hemû dangan diket:

Şeva dinê şeverêşa şev nemayî,  
Hawarîkê hatibû ne bi xoşî, ne bi şayî,  
De digotin cerdê avît ser qiranê pezê zomê bi tevayî,



Silêmanê Silîv, zavgê taze ji mal derket, şûr û xencer girêdayî,  
Dêranê wezê, porkurê wezê, seglaviya Silêmanê min î mêrxas, zivirî  
na-  
va malan li xûna sor da wê verdayî,  
Poşmanê wezê hawarî anîn digotin termê Silêmanê Silîv, zavgê  
taze,  
maye li serê rê û dirban bêxudan û de bêxwedî,  
De digotin wan necamêran derbekê bi dexesî li navmîla Silêmanê  
min  
vedayî,  
Gulîbirê Werdek, Silêmanê te yê çawa sala îsal bi mirazê xwe şa  
nebû bi  
gulşayî,  
De dêranê Werdê, bûka taze li xîveta bûkîniyê da tenê mayî,  
Îca bi wê wawîlokê ra jinikan porên xwe dirûçikandin û xwelî li serê  
xwe dikirin û digiriyan. Li dû wê wawîlokê ra Gulendama qîza Mîrî  
dest  
pê kir:  
Gulîbirê Gulîzer, dêranê Werdê îşev êvar da li êla mala bavê min  
porkurê kirin şevîxûne,  
De wan necamêran derbên dexesiyê li berî bedena çar mêrxasan  
dane,  
li ser piştta mehnegîyan da kirin sernixûne,  
Na Xudê li Zanga Xûnê li mala bavê mi porkurê dikirin qetl û xûn e  
De dema ko li van çar mêran dibû dexesî, bila lê derketa Hesê Dûdê  
bi  
koma kuran va wekî gurgên dev bi xûn e,

De heyfa minê nayê li tu heyfan, heyfa minê têye li wê heyfê, îro biko-

jê van çar mêran bêser û şûn e,

Dengê şîn û girîna jinikan li ser hemû dangan diket. Ne ji gav da pîre-jineke porsipî, ko porên wê yê kever ji bin çarika gewir da derketibû der-

125

BILÎCAN

va, li koma şîngêran derket. Pîrê porên xwe dirûçikand û ser û çavên xwe

dida ber pencerûskan. Ser û çavên pîrê li xûna sore gevez da mabû.

Pîrê

ber bi mirîşoyan çû û bû lawo lawo ya wê. Çend mêran bi destên wê ra

girtin û nehêlan ew li xwe bide. Pîrê li ber wan geriya û got:

Hûn û Yezdan ca bihêlin hema ez birîna Mihoyê xwe bibînim paşê.

Her wisan ko mêran bi destê wê ra girtibûn, ewê serê xwe li ser çepera

mirîşoyan ra bilind kir û li cenazê kurê xwe nihêrî û bû lawo lawoya wê.

Dengê wê wisan pir şewat bû, ko dilê keviran diavand:

Bêmirazo Miho! Bêkeso Miho! Te çawa ez tenê hêlam! Te çawa porê

min kur kir.

Li dû wîlewîla pîrê ra, dengê şewat ev wawîloka lorand:

Weylo lo weylo, weylo lo weylo, weylo lo weylo...

Gulavtûn qirkê Gulîzer dêran, dibêjin cerd derketî, cerda şevê, şev  
bi

xûn in.

Serekpehewan û mêrxasên mala bavê mi dêranê li dû cerdê  
dikevin,

şopa wan digerînin.

Şevereş e şev tarî ye, ew mêrxasan tişteke li ber çavên xwe nabînin.

De porkurê dibêjin cerdê xwe daye Zanga Xûnê, Kevirê Hirçê, li  
Çepa

Bexleciyê berê şîn in.

Necamêran destên xwe li tetika şûr û sîngiyên dilepînin.

Na Xudê bi dexesî devê şûr û nêzan li ser sîngê wan mêrxasan  
digerînin.

Çar mêrxasan bi hev ra li ser piştê mehnegiyên da verdigerînin.

Mehnegiyên bê xwedî û xudan li ser êlê da ew dişînin.

Komek ji komelê bi tewir û mere û kulingan va ber bi goristana  
zomê,

ko li serê çarêyana êle bû, çûn. Pêkve çar gorin li rex hevdu da,  
kulan. Ta

gorkolan gor kolan, mirîşoya şoştina terman kuta kiribûn. Mela  
Ehmed

û Mela Hesenî herduyan bi arîkariya hev kefenê sipî li kuştîyan  
werkirin.

Piştî kutabûna kefen, komelê bi hev ra her çar term, termên çar  
pehle-

wanan, çar mêrxasan, çar çakmêran dane ser darbestan û bi şîn û  
girîn ber

bi goristanê birin. Bi dengê şîn û girînê ra jin û zar û pîr û kal, giştî xelkê

êla Mîr Elî Siwarani weke deriyayeke pir pêl ber bi goristanê kişyan.

Te

derzî bavîta li ber komelê li erdê nediket. Li perê goristanê, li rex wan çar

gorinên ko taze kulabûn, her çar term danîne erdê.

Mela Ehmed pêş da li ber serê her çar terman rawesta û nivêja wan kir.

Li dû nivêjê ra ferman da, ko terman çal bikin. Pêş da termê Ehmed Begê

Mîrî rakirin û li şamiyê da edilandin. Li dû ra kevirê serînê danîn ser şamiyê û paşê gor bi tev selbend kirin. Li dû selbendan ra, bi meran xwalî

126 BILÎCAN

tijî ser keviran kirin û xwalî li ser gorina Ehmed Begî bû qûç. Mela Ehmed li ber serê gorina Ehmed Begî rawesta û telqîna wî pêş da bi Erebbî

û paşê jî bi kurdî weha dayê:

»Hey Ehmed Begê kurê Gulavtûnê! Yê mirî tu yî! Bersiva xwe baş bide!

Xudê raste. Pêxemberê wî rast e. Bihîşt û dogeh hemû rast in. Yê mirî tu

yî...«

Li dû telqîna Ehmed Begî ra, her sê termên dî jî veşartin. Mela Ehmedi

telqîna wan jî dayê. Û li dû telqînê ra mela Ehmed navê her çar kuştiyan

cuda cuda anî û ji komelê daxwaz kir, ko eger dilê kesekî ji wan mabe, bi-

la ji wan xweş bin. Komelê hemûyê bi hev ra gotin:

Em ji wana xweş dibin, xwedê jî ji wana xweş be!

Li dû ra komel li dora goristanê zincîrqol rawestan û fatiheyek xwendin. Paşê hema wisan bi gultetî li ser gorinan zivirîn û çûne ber derê

mala Mîrî û li ber derê mala wan rawestan û hema wisan li ser piyan fati-

heyek xwendin û gotin:

— Mîr bila canê te xweş be!

— Serê te xweş!

— Yezdan jê xweş be!

Li dû ra çûne ber derê mala Hesê Dûdêyî û li wê derê jî hema wisan li

ser piyan rawestayî man û gotin:

— Hesê bila canê te û her heft kurên te xweş be!

— Serê te xweş, Apê Hesê!

— Ciyê çûyî Yezdan lê nede şermê!

— Yezdan jê xweş be!

Li dû ra çûne ber derê mala Remo pehlewan û Mihoyi jî. Li wê derê jî

serexweşî dane wan û tev bi gultetî zivirîn dîwanxanê.

127

BILÎCAN

15

Şîneke giran li ser êla Mîr Elî Siwarani da hatibû. Êl tev da reşpoş bibû.

Mêran xavikên reş dabûne serên xwe û kirasên reş ber kiribûn. Giştî jinên

êlê serdanpê reş girtibûn. Te ko weha li ser kanî û devên çeman dinihêrî,

te digot qay qijikin, ko li rex avê ra hevraz û berjêr dibin. Şîneke reş û gi-

ran li ser wan da hatibû. Kiç û bûk û zerî û xanim û xatûn hind li şîna xoşewîstan da giryabûn, ko çav li serê wan da bibûn golên xûnê.

Li derekan deste destesiwar û peya dihatin hawarî û serexoşiya mala

Mîr û Hesê Dûdêyî.

Mala Mîrî çend xîvet bi hav ve girêdabûn û Mîr û Mela Ehmed û Mela

Hesen û Hesê Dûdê bi koma ridênsipî û giregrên êlê va li xîvetê da rûniştibûn û komel deste destedihatin, fatiheyek dixwendin û serexoşî

didane Mîr û êla wî û qaweyek vedixwarin û diçûn.

Mîrî gote Tajdînê Dengbêj:

»Tajdîn min ji te divê, ko tu ji Ehmed Beg û Silêmanî ra cotek kotel girêdî.«

Tajdîn li xîvetê derket û gazî meyteran kir û got:

»Kuro seglaviya Silêman û mehnegiya Ehmed Begî ji tewlexanan derînin û bînin. Emê ji wan ra kotelan girê bidin.«

Meyteran herdu mahîn ji tewlexanan deranîn û anîn ba Tajdînê

Dengbêj. Tajdinî pêş da kotela Silêmanî girêda. Ewî seglaviya Silêmanî  
pêş da zîn û pûsad kir. Li dû ra cil û bergên Silêmanî yên serekpehlewan-  
tiyê, ko hema xûn wisan pêva hişk bibû, bi hev va girêda û avête ser qaşa  
zînê seglaviyê. Li dû ra şûrê wî bi layeke terkiya zîni va girêda û nêza wî jî  
bi layê dî va. Mertal û zirêxê Silêmanî jî durust li ser qaşa zînî da ediland  
û bi zînebendan ew li ser zîni bi tew girêda.  
Îca li dû ra kotela Ehmed Begî jî girêda.  
Ew komela dereke ko dihatin serexoşiyê, gava ko bihîstin mala Mîrî kotelên kuştîyên xwe girêdane, ewan jî gava ko dihatin serexoşiyê, bi ko-  
tel dihatin.  
Ca dema ko gultên suwarên serexoşiyê ji dûr va dihatin xûyanê,

128 BILÎCAN

Tajdinî herdu kotel hêdî hêdî ber bi wan dihajot. Li pêşberî malan kotelên mala Mîrî û kotelên serexoşîvanan digihîştin hev. Îca gava ko ko-  
tel digihîştin hev, Tajdinî destê xwe li ber hev ra dikir û bi dengêkî pir şe-  
wat dilorand. Bi wawîloka Tajdinî ra serexoşîvanan jî dest pê dikirn û  
wawîlokek li ser teqil û miqamê wawîloka Tajdinî da digotin.

Herdu kotel wisan girêdayî li tewlexanan da bûn. Danê berî nîvro  
bû,  
ko meyteran gazî Tajdinî kirin û gotinê waye desteyek siwar ji  
zozanên  
Dîzgirêlan ber bi malan tîn.  
Tajdinî fenanî caran rabû , herdu kotel da destên meyteran û bixwe  
jî  
kete pêşiyê û ber bi gulta siwarên ko dihatin serexoşiyê çû. Herdu  
deste li  
bintara mala Mîrî da giheştin hev. Bi dîtina kotelê ra siwar hemû  
peya  
bûn. Tajdinî destên xwe li ber hev ra kir û weha qêr kirê:  
Hane li me hane...hane li me hane...li me hane...  
Ji derdê me ra peyda nabe, çi dermane...  
Birano derdê me giran e, hevalno dedrê me giran e...  
Îro ji me kuştine bi dexesî û necamêrî du cot serok û  
serokpehlewane...  
Na Xudê serokê pehlewane êla Mîrê ereban canpolat Silêman e...  
De dibê dema li ser serê Silêmanê Silîv dibû kulpa mêran, bila lê der-  
keta her heft lawên Hesê Dûdê bînanî gurên devbixûnî, na Xudê  
revda  
wan şêran e...  
De dêranê Werdê, gulîbirê Gulavtûn, qirikê Gulîzer, çawa îro Çepa  
Bexlecî, Zanga Xûnê dijmin li me kiriye qesasbxane...  
Heyfa min nayê ji kuştina van xoşmêran e...  
Heyfa min tê ji wê heyfê, îro dijmin û neyarên me yê nediyar û  
nexûyan e...  
Eger me yê bizaniya reşkujên me kî û di kîjane...



Me yê li ser serê wan girêda beraşên aşan, serê wan bihêra bi derbên

topizan û bi devê wan şûran e...

Me yê terş û talanên wan bikişanda bi zora xencer û serê sernêzan e...

Birano derdê me girane...

Na Xudê li ber derdên me aciz in, gişt hekîm û de loqman e...

Were emê destên hev ra bigirin peyda bikin reşkuj û van dizan e...

Hane li me hane ..hane li me hane...li me hane...

Vêca li desta pêşber li nav serexoşîvanan da dengbêjekî wan destê xwe

hejand û li bersiva Tajdinî da weha got:

Wey li mino lo Silêmano, wey li mino lo Silêmano...

129

BILÎCAN

Canpolato, serekpehlewano...

Rûmeta rûyê me kurdano...

Çomaqê nav çavên neyarano...

Bikoje dexes û dijminano...

Te yê çawa koma pehlewanan hêlaye bê xayî û bêxudano...

Li min lolo, li min lolo...Li min lo lo, li min lolo...

Hawarîkê hatî ji me kurdan ra hawarîka ne bi xêr e...

De êla Mîrê ereban îro li şîna xweşmêran da zêrezêr e...

Li wan hatiye kuştinê bi dexesê serekpehlewana û sê xasmêr e...

Yê yekê Silêman e, serokpehlewana e, seriyan difirîne, cendekan paş da

davêje, aşê serê dijminan e, na Xudê dijminhêr e...

Yê dinê Ehmed Beg e, serekê Siwaran, berdilka dilê Gulavtûnê, kilê çavên Gulîzerê, suwarê şepala şînboz, qudûmê çokên Mîrê ereban çî

xoşmêr e...

Ewê dinê Remoyê pehlewane, Xudê kem pehlewanakî zorî zorbeyî çî

navdêr e...

Yê dinê Mihoyê berdestkê mala Mîr e, dayîka wîna kor be jê re...

Li min lolo...li min lolo...li min lolo...

Vêca bi dengê wan herdu dengbêjana ra bû zêrezêra komelê û li ser hev

da giriyan. Jinekê destek dudu cilik li himêzê da hate pêşiya serexoşî-

vanan û ewan ber bi konê aliyê malê bir. Komel hemû li konê aliyê malê

da berev bûn û li ser kincikan da giriyan. Hindekan li xwe didan, hindekan porên xwe dirûçikandin.

Cilkên Silêmanî bi xêliya Werdekê ya sor û zer xemilandibûn.

Werdekê herdu guliyên xwe yên gevezên nû hine kirî li ser Silêmanî birîbûn. Ca herdu guliyên birî bi xêliya sore zere bûkinyê va li pêşira kur-

tikê Silêmanî va dirûbûn. Lê bi kincikên Ehmed Begî va heşt kite gulî darda kiribûn. Cotên xûşkan û dayîka wî û maliya wî Gulîzerê her yekê

cotek guliyên xwe li ser wî da birîbûn. Cilkên wan hema wisan bi xûnê va

hişk kirî mabû.

Komel piştî girînê tev rabûn û çûne dîwanxanê û li dîwanxanê da

hemûyê bi dengê Mela Ehmed ra fatiheyek xwendin. Li dû fatihê ra qawegerînan qawe gerandin.

Serexoşiya mala Mîr û Hesê Dûdêyî nêzîkiya mehekî kişand. Li çilê kuştiyan da Mîrî gote carçiyar:

»Bikin gazî, bila êl ji reşikê derkeve! »

130 BILÎCAN

Carçiyar kirin gazî. Êl ji reşikê derket. Hemûyan kincên xwe guhorîn. Reşên xwe rakirin. Her tenê Werdek ma. Hindî kirin û nekirin, Werdekê

kincên xwe neguhest. Hema wisan li şîna Silêmanî da reşpoş ma. Digotin eger mehek li ser ra derbas bibe, ava reşê bê çavên Werdekê.

Şev û roj hema karê wê bûye şîna û hêsirîn. Xwerê wê bûye rondik û girîn.

Hindî dayîka wê dibêjê Werdek ji serê bav û birayên xwe şermê bike, bese

negirî! Lê rondikên wê weke barana ewirê nîsanê jor da dibarin. Li alî bav

û birayên xwe jî hema wisan pîngepînga wê ye, dibêje û dilorîne.

Komel her yek li bara wê da tişteke dibêjin:

— Dayîka wê kor be jê re.

— Neyaran nehîştin hema salek li ser zemawenda wan ra derbas bibe.

— Nehêlan hema du meh li ser zavatiya Silêmanî ra derbas bibe.

— Yezdan wan bêmiraz bikuje. Ewan Werdek û Silêman bêmiraz kirin. Çawa nehîştin ew herdu pehlewana bi mirazên xwe şa bibin.

— Werdeka belengaz yê xwe bikuje.

— Kiçê yê li derdê Silêmanî da bibiece.  
 — Destên wê bi hinê va ma.  
 — Belengazê duhalaye jî.  
 — Yezdan wan poşman bike !  
 — Ez gazî şems û şêxan dikim, xudêyê wan kor û kotî bike! Derdê kotîbûnê li wan derîne û kerrê kotîbûnê ji wan bixîne!  
 — Şems wan ji ronahîka çavan bêpar û pişk bihêle!  
 — Belengazê çawa zarika wê bû paşbavî!  
 — Kiçê belengazê wekî negirî û nelorîne, yê bibiece.  
 — A, a. yê diq bike.  
 — Ew bi şîn û girînê kula dilê xwe sar dike.  
 — Dibêjin sûnd xwariye, ko piştî Silêmanî çi mêran neke.  
 — Yezdan kem mafê wê heye.  
 — Erê, erê, ew jineke xudanemek e.  
 — Werdek? Ew piştî Silêmanî çi mêran nake...  
 Komelê li bara wê û li ser rewşa wê da bi her cureyê diaxiftin.

131

BILÎCAN

16

Hê du meh li ser wê qewimîna reş ra derbas nebibû, ko rojekê Hesê û kurê xwe yê mezin û Mela Hesên ne li demê dîwanê da, çûne bal Mîrî.  
 Hesê xeberek vir da anî, yêk li dera han, ta ko gihîşte ser rewşa mala Silêmanî û çawaniya Werdekê û tenêmana wê.  
 Mîrî got:

»Hesê ev qewimîna reşe giran li ser me hemûyê da hatiye. Em hemû jî her dilbirîndarin. Bi Yezdan kem Hesê min Silêman li ser kurên xwe ra digirt. Pêkêşka Silêmanî li bal min, ji ya Ehmed Begî girantir bû. Bila ro- ja îro ew her sê kurên min yên dî jî bimirana, ne ko mûyek ji serê Silêmanê Silîvî kêmbiba.«

Îca bi înana navê Silêmanî ra keserek kûr kişand.

Hesê got:

»Mîr Yezdan kurên te ji te ra bihêle. Ma Silêmanê Silîvî gelekî ji Ehmed Begî xoşdevîtir bû. Ma li qewimîna giran da Silêman tenê hatiye kuştinê.

Mêr li ber av û axa xwe da tîn kuştinê. Kuştina mêran li rêka welatî da

şayiya gel e. Gel bi xwe dinaze, ko mêrxasên wan li ber wan da, li ber av

û axa wan da li ber talanên wan da xwe dane kuştinê, xwe gorî kirine.

Tenê tiştê ko em hemû li ber da bê hewkin, eve ye ko mêrxasên me bi

reşkujî ji holê rabûne. Em nizanin, ka kê ev yeka bi serê me kir. Dena her

berxa nêr, ji bo kêrê ye. Lê Mîrîm ya Werdekê, gotin pêdivî nîne.

Werdek dîsan jî her bûka te ye. Tenê me got eger destûra te hebe, em

xîveta wê hema wisan bi xemil û rewşa wê va bibin li rex mala me vegirin.

Em naxwazin ko rewşa mala Silêmanî xerab bikin. Lê hûn bixwe ji me

çêtir dizanin, xîveta Werdekê li rex mal me, ko ew jî her mala we bixwe

ye, li nêzîkê dayîka wê be, baştir e. Werdek dîsan jî her bûka te ye.»

Serê Mîrî li ber da bû û guhdarî gotinên Hesêyi dikir. Piştî demeke xurt, Mîrî serê xwe ji ber xwe derxist. Çavên wî tijî bibûn. Bi kesereke kûr

bersiva Hesêyi da:

»Hesê Yezdan dizanê, ko min ji Silêmanî û Werdekê ra nexşên jiyaneke

serferaz û domdirêj kişandibû. Lê bi dax û derdên giran va neyaran ne-

132 BILÎCAN

hîştin. Rast e ko min Werdek wekî bûka xwe ji mala te siwar kir û anî û

li rex mala xwe ji wan ra xîvet da vegirtinê. Her wekî te gotî, dîsan jî her

ez Werdekê ji xwe ra bûk dizanim. Lê ez jî hema li ser hizra te me. Xîveta

Werdekê roja îro li rex mala te be çêtir e. Her çawa hebe tu bavê Werdekê

yî. Xûşka Kewê dikare baştir lê agadar be. Baş bû, ko te bixwe ev yeka

hilxist. Her niha ezê bêjim rênçberan, bila alî zaroyên we xîveta Werdekê

rakin û bibin li rex mala we danên. Em dîsan jî her xizmin.«

Hesêyi got:

»Zor sipas Mîrîê min!«

— Sipas xweş Hesê!

Mela Heseni ko ta niha qet peyvek jî neaxiftibû, rabû şipê û destê xwe

da sîngê û got:

»Yezdan te payedar bike Mîr! Xudê siya te li ser serê me kême neke!  
Xudê tifaq û yêkatiya me ragire!«

— Xudê ji te xoş be Mela Heseni!

Li dû van teklîfana ra Hesê û Mela Heseni xatirê xwe ji Mîrî xwestin û

ji dîwanxanê derketin.

Hê bîstek li ser ra nebihorîbû, ko kurên Hesê Dûdêyî bi arîkariya Mîro

û çend rênçber û berdestkan va, navmala Werdekê berev kirin û istûna

xîveta Silêmanî li ber xîvetê hilanîn. Destên Werdekê li çî tiştî nedigeriya.

Werdekê destên xwe li ber hev ra kiribû û li pêşber xîvetê li ser rûniştekek

kevirîn rûniştibû û posîde posîde li kavihbûna hêlûna xwe û Silêmanî ya

çend mehî dinihêrî.

Gava ko xîveta Silêmanî ji cî leqiya. Gulavtûn û Gulîzer û Gulendam û Gulindar, bi koma jin û bûk û qîzan va hatin û destên xwe li ustuyê

Werdekê ra birin û hema wisan li derva şînek giran danîn. Piştî qaseke

xurt ridênsipiyek ji xîvetê derket û hate bal wan û gote Gulavtûnê:  
»Gulavtûn xatûn tikaye êdî bese! Negirîn! Nehêle ew zarûyana wisan

bizarin. Mîr dibêje bila nehêlin Werdek bê hewik bibe.!«

Bi vê gotina ridênsipiyi ra Gulavtûnê çavên xwe ji hêsiran paqij kir û gote Werdekê û yên dî:

»Lawo êdî bes e! Em çendê bigirîn jî, dilê me hêsayî nabe. Rabin! Rabin!«

Li dû gotina Gulavtûnê ra hemû ji cî rabûn. Lê kela Werdekê sar ned-ibû. Werdek her wisan kul diçû. Gulîzerê destên xwe uskura Werdekê ra

biribû û herdu tev digiriyan. Gulavtûn hat û li ber wan geriya û bi zorê

ew herdu kir kirin.

133

BILÎCAN

Li demeke kurt da xîvet jêk weşiya û mal hate berev kirinê û bargiranî

li hêştiran hate bar kirinê û li ber derê mala Hesê Dûdêyî hate danînê.

Werdekê jî destên xwe li ber hev ra kirî, bi pîngepîng da dû mal û xîveta

Silêmanî. Du, sê bûk û zeriyan mala Mîrî jî di gel wê rê ketin.

Xîveta Silêmanî li rex mala Hesê Dûdêyî hate vegirtinê. Dayîka

Werdekê hate bal kurên xwe û gote wan:



»Lawo tikaye, xîveta Silêmanî ji pergâl mexin! Dîsan her wekî berê bix-

emilînin.«

Û gazî Werdekê jî kir û gotê:

»Lawo were! Were dîsan mala xwe wekî berê bixemilîne!«

Li dû gotina Kewê ra, Werdek û ewanên ko di gel wê hatibûn jî, hatin

alî kuran. Werdekê dîsan hundurê xîvetê bi pirêza xwe, wekî berê bi

xemil û pergâl kir. Cil û bergên Silêmanî yê zavatiyê bi ustûna nîveka xîvetê va darda kir û kincên serekpehlewantiyê jî bi ustûneke dî va darda

kir. Xencera wî li ber kemberê ra kir. Şûr û nêzeyê wî jî siparte ber wê

ustûnê.

Werdekê bi dîtina wan cil û berg û wan çekên Silêmanî ra seha dilxweşiyê dikir. Gava ko çavên wê li wan diket, we dihizirî ko Silêman zindî ye.

Eve du, sê heftiyê, ko rewşa Werdekê hatiye guhertinê. Dilê wê tevî hev

dibe. Serê wê gêj dibe. Berşojkî dibe. Hilqên vereşandinê tîne. Hindek

caran jî her vedireşe û aveke zer û qîçik ji devî tê. Çavên wê reş û tarî dib-

in. Dilê wê dixerike. Xwazî dibe. Pîrxor bûye. Dilê wê xwerekên cur be

cur dixwaze. Dilê wê xwerekên wisan dixwaze, ko dem û danê wê  
xw-  
erekê nîne. Rojê dilê wê dibije xwerekekê. Hindek xwerekan jî  
nikare  
bixwe. Bi dîtina hindek xwerekan ra hilq tîne. Dayîka wê dibêje:  
Werdek nebîraniya dikişîne.  
Her çî ya ko dilê Werdekê bixwesta, li ber perê asîmanan ba jî,  
lawên  
Hesê Dûdêyî jê ra dihanîn. Werdekê şîrê firindan jî bixwesta, her  
heft bi-  
rayên wê jê ra peyda dikirin. Her didanekî Werdekê tamedê dixwar.  
Werdek roj bi rojê giran û girantir dibû. Zikê wê roj bi rojê berve  
diçû  
û roj bi rojê mezin û mezintir dibû. Werdek xewar bibû. Hema li ko  
ra  
digihîşt serê xwe dadinî û xew ra diçû. Hind razabû, ko çavên wê  
wer-  
imîbûn. Piştî wê diêşîya. Pê we bû, ko li bin barekî giran da ye.  
Carinan  
birûskê digirtê, û li cî da rûdinişt û nikarî ji cî bilive. Li ber çîk û  
birûskan  
xwe dikire girê û li cî da rûdinişt. Çavên wê reşvetarî dibûn. Serê wê  
gêj  
dibû. Topa cîhanê li dora serê wê ra dibû zivirok. Li demên weha da  
dayî-

134 BILÎCAN

ka wê li hawariya wê da dihat. Ewê hêdî û bi hemmet pêş da pişta  
wê û li  
dû ra teniştên wê hêdî mist dida û bi aramî destên xwe li ser zikê  
wê di-  
gerand. Paşî qasekê birûskê ew berdida û Werdek dîsan radibû ser  
xwe.  
Neh meh û neh roj û neh şev û neh demjimêr li ser zemawenda  
Werdekê û Silêmanî ra bihorîbûn. Sê, çar jinikan Werdek li nav hev  
ra  
kiribûn. Du, sê porsipî lê berev bibûn. Pêş da birûskên hûrik hatin  
Werdekê. Xûyeke zeliqokî li ser eniya Werdekê rûnişt. Paşê  
berebere çîk  
û birûsk tund û tundtir bûn. Werdekê berê li ber xwe da. Xwe ragirt.  
Tenê li ber êşê serê xwe dihejand û lêva xwe dikot û li ber lêva xwe  
da  
dikire ofeof. Lê berebere çîk û birûskan ew li nav hev da pêçan û  
hêza li  
ber xwedanê jê standin. Pêş da Werdekê hêdîka û bi şerm û fedî  
dikire îş  
û of. Lê hêdî hêdî dengê wê bilind û bilindtir bû û nalenala wê bû  
qare-  
qar û qîjeqîj. Dengê qareqara Werdekê li ser êlê ket. Zome hejikand.  
Êl  
li ser serê wan da hanî. Dayîka wê xwe lê hêrs kir û gotê:  
»Kiçê te xêr e! Te êl û zome li ser serê me da hanî! Qirikê şermê  
bike! Te  
em rusva kirin. Ne qaşoka tu pehlewanî!?«  
Werdek hem diqîjiya û hem jî bersiva dayîka xwe dida:

»Dadê reben ma canê pehlewanan can nîne? Ma pehlewan êşê nizanin?

Ma çêlekan pehlewan înane?»

Bi qîjeqîj û zarezara Werdekê ra pîrekan ew li ser çokan danîbûn.

Du,

sêkan pê ra girtibûn. Pîreka mezin ko li ser serê wan ra rawestabû û destûr

dida wan, li ser Werdekê da qîjiya û gotê:

»Ha Werdeka pehlewan! Ha hingeke dî! Ha xwe vê carê jî bidê! Ha hêzeke dî! Ha hingek dî! Hema hindik maye ha! Dey dey... Aha kutabû...«

Bi vê gotina pîreka porsipî ra weirêna zarekê hundur tijî kir. Dengê zarokê ji xîvetê derket û belawî axaran bû.

Pîreka porsipî xwar bû û li nav lingê biçûkê nihêrî û kire gazî:

»Sipas ji Yezdanî ra, kur e, kur. Mizginiyê bidin kalkê wî! Bêjinê Yezdan kurek daye Werdekê. Sipas ji Xudê ra, ko Silêman bêdûnda ne-

ma.«

Werdek hema wisan li ser çokan mabû û li nava xûnê û xûyê da mewicîbû. Bo demeke kurt Werdekê seha hisiyanewê kir. Lê dîsan birûsk hatinê. Pîrekan destê Werdekê ra girtin û xwestin ewê ji cî rakin.

Lê Werdekê got:

»Dîsan birûsk têne min.«

Her yekê ji pîrekan tiştê gotin:

135

BILÎCAN

— Çi nake hevalbiçûk e.

— Xwe nede hêzan bila bixwe bikeve.

— Eger tu xwe bidî hêzan malzarka te yê jor da dakeve.

Lê Werdekê xwe li ber êşê ranegirt û dîsan li ser çokan ket û dîsan hêz

dane xwe.

Pîreka porsipî destê xwe da zikê wê û got:

»Aha! Yekî dî jî. Xwe bide hêzan! Hêdî, hêdî!

— Ha dayîka min Werdek! Xwe bide ser çokan!

— Xwe bidê!

— Ha hingek dî!

— Hema vê carê!

— Dey, dey!

— Aha serê zarokê hat!

— Hema vê carê, hema vê carê!

Weirîneke dî jî li ser kon û xîvetan ket, porsipiyê dîsan jî li nav lingên biçûkê nihêrî û dîsan gazî kir:

»Eva jî kur e. Eva jî kur e.«

Dengê şayî û keyfxoşiya jinikan li hundurê xîveta Werdekê zoma Mîr Elî Siwarani hejikand. Vê carê Besê ya porsipî bixwe, xwe bi devê xîveta

Hesê Dûdêyî ra gîhand û got:

»Mizgîniya min bide Hesê! Yezdan cotek kur daye Werdekê.«

Bi mizgîniya Besê ra şîrqîn kete hundurê xîveta Hesê Dûdêyî û bû vire-

vira zêr û pareyan li ser Besê da barî.

Hesê pirsî Werdek çawaye?

— Sipas ji Yezdan ra, dema wê jî, ya herdu kurikan jî saze. Çi cîhê ni-

hêranyê tune ye.

Besê zêr û pareyên xwe li quşa xwe da cî kir û bi keyfxoşî ber bi xîveta

Werdekê zivirî û li dora Werdekê ra bû turik. Pêş da serê wê îşkeîşk girê-

da. Paşê pişta wê şidand û li dû ra ferman da pîrekên dî, ko ji Werdekê ra

karê jajerûnê bikin.

Li dû Besê ra tabetî nehate Hesêyi. Hesê ji xîveta xwe derket û hate ber

devê xîveta Werdekê rawesta û bangî jinka xwe kir û gotê:

»Çavên te ronahî Kewê!«

— Çavên te jî ronahî Hesê!

— Pêdivî bû, ko yekê şûr û nêza Silêmanî hilda.

— Sipas ji Yezdan ra li cîhê yekê Werdek bû xudanê du kuran.

Jinên êla Eliyê Siwarani deste destebi înanan xanan dihatin sera

136 BILÎCAN

Werdekê. Taze heftê Werdekê kuta bibû, ko komek ji xizm û kes û karên

mala Hesê Dûdêyî li xîveta wan da kom bûn.

Hesêyi gote Kewê:

»Keçê bêje bila herdu zarokan bînin. Bila Werdek jî bê.«

Li dû fermana Hesêyi ra, herdu zarok li nava pêçikan da hanîn xîveta Hesêyi. Kewê û Werdek û pîrikên zaroyan jî dane dû herdu pêçikan û li

biniya xîvetê da rûniştin. Werdekê serê xwe kiribû ber xwe. Şerm dikir.

Komelê herdu zarok li ser destan gerandin û nîşanê hev dan. Li dû  
ra

Hesê kolozê xwe li serê xwe deranê û berê xwe li ser koma xwe da  
kir û

got:

»Gelî xizm û kesên hêja! Îro roja navlêkirina zarokan e. Her yek ji  
we

du navên ko hûn hêjayî Werdekê û Silêmanî dizanin, binivîsin û  
bavêjin

nav kolozê min. Lê tikayê ji we dikim, ko tenê navên kurdî binivîsin.  
Em

kurd in. Pêdiviyê, em navê kurdî li zarokên xwe bikin. Êdî em navên  
ere-

bî û romî û ecemî li biçûkên xwe nakin. Her gelekê navên xwe yên  
tay-

betî hene. Eger em gelê kurd jî xwe gelekê serbixwe dizanin, debê  
ko em

jî navên kurdî li zaroyên xwe bikin. Her gel û bereyekê navên xwe  
yên

taybetî hene. Zimanê kurdî jî li vê barê da zimanekî pir zengîn e. Êdî  
nabe ko em navên neyî Kurdî li zarokên xwe bikin. Navên nîştimanî

nîvek ji serxwebûnêye.«

Li dû fermana Hesêyi ra bû çîreçîra qeleman li ser kaxetan geriya.  
Her

kesê gorî wîst û pêxoşî û zanîna xwe cotek nav nivîsîn û avîtin nav  
kolozê

Hesêyi. Hesê berê xwe li ser Werdekê da kir û gotê:

»Lawo lê tu çima nanivîsî!?«

Îca li dû gotina xwe ra qelem û kaxeta xwe dirêjî layê Werdekê kir.  
Werdekê qelem û kaxeta bavê xwe hilda û du nav li ser nivîsî û avîte  
nav

kolozê Hesêyi. Li dû ra koloz dane destê Pêşengê nebiyê Hesê û  
gotinê:

Pêşeng li nav wan kaxetan da tenê kaxetekî hilîne.

Pêşengî kaxetek li nav kaxetan hilgirt û da destê Hesêyi. Hesê qetê  
kax-

etê jev vekir û weha xwend:

Ker û Kulik!

Şîrqîn kete komelê û hemûyê bi hev ra pîrozbayî li Hesê û Kewê û  
Werdekê kirin:

— Pîroz be!

— Nav li cîhanê bin!

— Navdêr bin!

— Mêrxas bin!

137

BILÎCAN

— Şûrê bavê xwe hildin!

— Nêza bavê xwe hildin!

— Bi kal û pîr mezin bin!

— Gurzê bavpîrê xwe hildin!

— Wek day û bab û kal û pîrên xwe bin!

Li dû navan ra dengê neyîkê û gerandina şîrînî û şerbetan tevî hev  
bû.

Satoreyê begzade neyîka xwe bi miqamekî şad û sivik anî nalînê.

Jinikan



tiîlandinê. Mêran fîqandinê û rê û risma navlêkirina herdu kurên  
Werdekê bi şayî û keyfxoşî kuta bû.

138 BILÎCAN

17

Ker û Kulik roj bi rojê weke du karên xezalan, weke cotek berxên  
nêr

diberidîn. Du pêçikên dirêj û raçandî. Du zarên bi gevde û gir û be-  
ranî. Yek rojiyê da weke yek heyviyan, yek heyviyê da weke yek  
saliyan,

yek saliyê da weke heft saliyan dihatin xûyanê. Roj bi rojê mezin û  
mez-

intir dibûn. Bejin vedidan û bala her kesî li ser xwe da radikişandin.

Dara sipîndarê eger li ciyekî avî da şîn bibe, reh û rîşalan davêje erdê  
û

roj bi rojê azad û serbest bejin vedide. Şûşmanî dibe û ber bi  
asîmanan

hildikişe. Tûkilê wê sipîndara li erdê avî da hêşîn bûyî, wisan saf û  
hilo

dibe, ko rewneq dikevê û diçilvile û difire nav çavên mirovi. Li du  
saliyê

da çiq û pelgan davêje û dibe dareke qert. Kerr û Kulik jî wekî cotek  
sipîndarên avî bejin vedidan. Şûşmanî dibûn û hevraz hildikişiyên.

Werdekê herdu zarên xwe jî bi şîrê xwe dimêjand. Nedihîşt şîrê  
ajelan

bidene wan. Dayîka wê kiribû û nekiribû, nehîştibû, yekê ji wan  
bidin

dayînan bimêjînin. Ewê zaroyên xwe bi sînga xwe, bi şîrê berên xwe,  
bi  
şîreya gîranê xwe mêjand. Şev û roj bonetî herdu zarên xwe  
hisiyanewe ji  
xwe herimand. Yek dimêjand û radizand, îca yê dî dida ber çîçikên  
xwe.  
Ew jî têr dikir û li rex yê dî radizand. Carinan jî hema herdu pêkve  
didana  
li ser çokên xwe û bi wan ra dileyst û hewka dilê xwe bi wan dianî.  
Bêhna  
wê gelekî bi van biçûkana derdiket.  
Carinan herdu kurên xwe dida ser çokên xwe û bi wan dileyist û ev  
helbestoka ji wan ra bi teqil û miqam dixwend:  
Sipas bo te xudêyo!  
Te cotek kur daye hirçêyo!  
Bêhna hêrçê pê bêyo!...  
Hindî bibû dayîk, lap Silêman ji bîr kiribû. Her cara ko Silêman dikete  
bîrê, xwe ji xwe ra digot:  
»Sipas ji Yezdanî ra, ko bê dûnda nema. Dîsan başe du kur, du mêt,  
du  
fêriz li dewsa xwe hîşt. Sipas ji te ra Yezdano!«

139

BILÎCAN

Ker û Kulik şev û roj li ser çokên kalikê xwe, li ser ustuyên xalên xwe,  
li  
ber sîngê dapîra xwe û li paşela Werdekê da mezin dibûn. Kalikê  
wan

Hesê Dûdêyî hema li zarotiyê da ew herduk fêrî fend û fêlên  
pehlewan-  
tiyê dikir. Ji her yekê ra nêzeyeke biçûk û şûrekî kûşke dabû  
girêdanê.  
Heftiyê carekê ewan li pêş konan berdidane pêsîra hev û ewan hîmî  
şûr-  
weşînî û nêzebazyê dikir. Ew herdu bînanî du kelokên şeri berdida  
pêsîra  
hev. Dema ko ewan ji şûrweşînî û nêzebazyê têr dibûn û  
diwestiyan, îca  
ew herdu berdida milmilanê. Herduk weke du kelçekan diketin  
zoranê.  
Herduyan bersînganê digirtin û bînanî du kelçekan, du kelçekên  
cewan  
û ciwan û pirçîn, du kelên qelew û hulû bi qelûnkêşan hevdu hevraz  
û  
berjêr dikirin. Îca evê hewîsanê li ser leşê wan kar dikir. Roj bi rojê  
gir û  
gevde û bi hêz û pêz dibûn. Her çiya ko kalikê wan jî ji bîr bikira,  
ewan li  
ber destên Werdekê û her heft xalên xwe hîm dibûn. Gelek caran jî  
Werdekê tenê ewan her li hundurê xîveta Silêmanî da dida  
rûniştandinê  
û ewan bi hûrgilî li fend û fêl û çep û çûrên nêzebazî û şûrweşîniyê  
agadar  
dikirin. Ev herdu zarok seretaya jîna xwe bi milmilanê û zoranê, bi  
şûr-

weşîniyê û nêzebaziye û xenceranê dest pê kirin. jiyana ko bi  
pehlewani-  
tiyê dest pê bibe, dê bi pehlewaniyê jî bidome û kuta bibe.  
Ji bilî fêrkariyên pehlewaniyê û hewîsanê, kalikê wan Hesê Dûdêyî  
ro-  
jê danekî ji wana ra ji Mishefa reş, ji dîwana şêx Adê helbest û  
xwendeyên  
ayînî bi teqil û miqam dixwend û ewan fêrî elifbêtikên Êzdîkî dikir.  
Kerr  
û Kulik roj bo rojê baş li ser elifbêtikên Êzdîkî diketin û berebere  
dikanîn  
bi elifbêtikên Êzdîkî navên xwe, navê dayîka xwe û navê kalikê xwe  
binivîsin. Her yekê ji wan jî çend rêzehelbest ji dîwana şêx Adêyî li  
ber  
kiribûn û bînanî kalikê xwe bi miqam dixwendin. ewan jî çav dabûne  
xalên xwe, her ji Hesê ra digotin bavo. ewan her Hesê bavê xwe  
dizanîn.  
Zaroyên paşbavî bûn. Nizanîn ka bav kî ye û kalik kî ye. Werdekê jî  
nedixwest zaroyên wê li temenê biçûktiyê da bi sewilîkbûna xwe  
bihesin.  
Nedixwest zaroyên wê li wê barê da tişteke bizanibin û li ber  
sewîlîkbûnê  
li ber xwe bikevin. Ewê hê nedixwest ya bavê wan ji wan ra gilî bike.  
Zaroyan jî her we dizanîn ko Hesê bavê wanaye jî.  
Hesê gelek caran her bixwe li gel wan dikete nêzebazî û  
şûrweşîniyê. Îca  
gelek caran qestîka li ber wan şikest dida xwe û bi wan şa dibû.  
Hindek

caran jî Hesê Kerr û xalê wî yê biçûk berdida şerî û bixwe jî li ber radi-

westa û eger şaşiyek kerrî heba, nîşanî wî dida. Hindek caran jî Hesê nav

li xalê wî dida û ew şîret dikir, ko qestîka xwe li ber kerri bişkênîne. kerrî

jî her bawer dikir ko şikest daye xalê xwe. Ca bi vê hindê li ber xwe ra

140 BILÎCAN

diçû. Xalê wî yê biçûk şeş heft salan ji wî mezintir bû. Lê kerr wisan givi-

rokî bibû, hema hindik mabû hindî wî lê bê. Zor caran li milmilanê da

her rastî jî kerrî zora xalê xwe dibir û pişta wî ditewand, lê hê baş pê

nikarî. Xalê wî li ser gotina Hesêyi gelek caran xwe li ber da davîte erdê û

yan jî li ber direvî û bi wî dida selimandinê ko li ber şikest xwariye. Ca

hînga kerr bi wê hindê li ber pişika xwe ra diçû. Şa dibû. Per vedida. Li

ser xwe diçû.

Ker û Kulik bi vî cureyî li jêr destên kalikê xwe û dayîka xwe da perwerde dibûn. ewan li çar, pênc saliya xwe da li ser pişka zore fend û fêlên

pehlewantiyê ketibûn.

Êdî kerr û Kulik mezin bibûn û tenê dikarî bi serên xwe herin nav

zarûyên êlê û bileyzin. Ewan hemû rojê li danê leyzê da diçûne nav  
heval  
û hevtemenên xwe û dileystin. Leyzên cur be cur, yên weke;  
kabanê,  
melanê, holanê, pîtanê, matanê, gîzanê, cirîdanê, hestikêşevê,  
meydanê,  
cerdanê, dizgiranê, şeranê, çavşêrkanê, elanê û sedan leyzên dî. Lê  
kerr û  
Kulikên ko li ber destên dayîka xwe û kalik û her heft xalên xwe bi  
serbestî û xoşewîstî mezin bibûn, ser li ber çî zaroyan danedinên û  
zor li  
hemûyan dikirin. Hewk û arama zaroyên êlê ji destên herdu birayan  
da  
nemabû. Navê kerr û Kuliki dihat, zaroyên êlê xwe vedişartin. Roj  
nebû  
ko kerr û Kulik serê zareke zomê neşkênin, milê yekê ji cî dernexin.  
Kerr  
û Kuliki çî bigotana zarok li xeberdaniya wan dernediketin. Komelê  
jî li  
ber Hesê Dûdêyî û li ber Werdeka dilişkestî deng nedikirin. Digotin  
zaron e çî nakin. Tê nagîjin.  
Li leyza malkomalkoyê da her dem kerr li nexşa malîvan û  
sermezinê  
malê da dileyst. Kulik jî li gel kulîlka nebiya Mîrî, ko ew jî weke kerr  
û  
Kuliki paşbavî bû, bibû hevleyiz. Zaroyan kulîlk ji Kuliki ra siwar  
dikirin

û li ber perda bûkinyê peya dikirin. Kulîlk jî weke kerr û Kuliki  
xoşewîs-

ta kalikê xwe bû. Xoşina komelê jî pir bi wê ra dihat. Lê berebere  
kulîlkê

û Kuliki her rastî keyf bi hevdu dihatin. her di gel hevdu digeriyan û  
ji

hevdu cuda nedibûn. Cîhana zarotiyê cîhaneke pir cuda ye.  
Herduyan

dest li ustuyên hev ra dibirin û lali Hesê û Werdekê wan, hevdu  
radimûsan. Ca bi vê kiriyara wan hemû bi wan dikeniyar û pê xweş  
dibûn.

Ker û Kulik roj bi rojê mezin dibûn. Hindî roj li ser wan ra derbas  
dibû,

hind diçûn dirtir û netirstir dibûn. Zaroyên êlê ji destên wan da  
hatibûn

zarê. Roja ko ev herduyan xûn li ser zarekî nexistana, ew roj roja  
wan

nibû. Êdî te digot qay ev herdu gurgana fêrî xûnê bûne. Devên wan  
bî-

141

BILÎCAN

nanî gurgên derbuharî li xûnê ketibûn. Êdî berebere kiriyarên wan  
li rade

û receyê derket û xelik ji destên wan werez bûn û hemû rojê  
gazindên

wan dihanîn ba kalikê wan Hesêyi. Sikalaya wan dibirin bal Mîrî û ji

destên wan gazinde dikirin. Lê dilê Mîrî li ber zaroyan dernediket û her

demê digot:

»Çi nake, zaro ne, zaro bînanî seqanin. Rojê heft caran hevdu digevizînin û dîsan tîn û pêkve li ser dandûrekî dixon û vedixon.«

Mîrî her yek bi curekî li ser serê xwe rêç dikir. Hesê jî herwekî Mîrî gazindekir her yek bi zimanekî nerm û lûs li ser serê xwe dûr dixist.

Lê çî

kesî tişteke nedigote biçûkan. Ta ko rojekê Kerrî kevirek avît û çavê zarekê

rijand. Kevir hema durust li bîbika çavê wî zariyê ketibû û çavê wî bilqi-

jandibû. Li wê demê da bavê wî zarokî, gava ko ew sosreta giran bi çav dît,

tûre bû, û li teberê derket û xwe bi Kerrî ra gîhand û du sîlên tûj li bineguha Kerrî da lêda û gotê:

»Gor bi gorê bavê we jî hema bînanî we nehecimtî bû, heta ko gihîşte

mafê xwe û lêdan cergên wî kunkunî kirin.«

Li ser vê gotinê çend kes li ser zaroyên Silêmanî sil bûn û bi tundî bersi-

va wî dan û xeberên wan li hevdu xweş nehat û pêş da devojenî hevdu

bûn û li dû ra dujînên krêt bi hev dan û li peyê ra hêriş dane hev û bi

pêşîra hevdu ra girtin. Ca bi destopişkbûna wan ra, ji her alî mên û jin



daketin herafê meydanê û her di gavekê da şer dest pê bû. Dutîretî  
kete

nav êlê û herdu desteyên êlê li ber hev pelişîn û şer giran bû. Ta ko  
mîr û

Mela Ehmed û Mela Hesên û Hesê Dûdêyî xwe pê ra gîhandin, ji her  
aliyan neh, deh serî û sî çil mil û parxan şkestin. dijminatî û  
dutîretiyeke

mezin kete nava êla Mîr Elî Siwarani da.

Li dû vî şerê giran ra Mîr û Hesê û Mela Ehmed şêvir danîn û ro kirin  
û pîvan, ta ko hatin ser wê biriyarê, ko zaroyan bişînin ba mala  
apanên

wan. Ta ko bi şandina wan ew dijminatî û dutîretiya li nîveka êlê da  
ji

holê rabe û bi wê hindê avekî li ser wî agirî da bikin. Lê hê şêvra  
dîwanx-

anê kuta nebibû, ko Kerr û Kuliki xwe bi dayîka xwe ra gîhandin û jê  
pîrsîn:

» Werdê ma bavê me kî ye?«

— Bavê we Hesê ye.

— Na Werdê, bavê te nabe bavê me.

— Hesê bavê te ye, ne bavê me ye. Ya rast ji me ra bêje!

Werdekê dîna xwe dayê taze kar ji karî bihorî ye. Taze neşê veşêre.

Zaro

pê hesiyan e. Ya baş ew e, ko ya rastî ji wan ra bêje. Werdekê bi  
neçarî

142 BILÎCAN

destê xwe da bin çena xwe û serbihoriya xwe û Silêmanî û kuştina

Silêmanî ji biçûkan ra şirove kir:

Kerr û Kuliki ta kutayê guçkên xwe li gotinên Werdekê dagirtin.

Qewimîn û serhatiya serên day û bavê wan weke perdeyekê li pêş çavên

wan ra derbas bû, û herdukan pêkve gotin:

»Dadê dilê xwe neke, êdî em li vira namînin. Karê xwe bike, emê herin

bigîjin babistînen xwe. Emê herin bigîjin malbata xwe. Em êdî li bin tûmê xelkê da namînin.«

— Karê çi kurên min.

— Na dadê em êdî nikarin li vira bimînin.

— Em nikarin li bin tûmê xelkê da bimînin.

— Kurên min kîjan xelk? Xelkê çi? Hûn vaye li mala kalikê xwe da dimînin. Heft xalên we hene.

— Rast e ko heft xalên me hene. Kalikê me heye. Lê xal û kalik ji me ra

nabin bab û babistîn.

— Kurên min babistînen we niha her we nas nakin. Ev e çendik û çend

salin, ko bavê we ji wan qetiya ye. Her kesek li dû bavê we ra jî nehat.

Hûn niha herin jî çi kes we nas nake. Çûyîna we bêçine ye.

Li vê got û bêjê da bûn, ko Hesê li wan derket. Hesê jî hatibû ko bi zi-

manekî Werdekê serwext bike, da ko karê xwe bike û herdu kurên xwe

hilde û here bigîje tîgelanên xwe. Ta ko bi çûyîna wê û zarokan ra avek li

ser agirê dijminatî û dutîretiya ko li nîveka êla Mîrî da çê bibû, bê rijand-

inê.

Gava ko Hesê hate jorê, Werdekê serê xwe kire ber xwe da. Herdu kurikan jî serên xwe daxistin. Kerrî lêva xwe dikot û li binî va li kalikê xwe

dinihêrî.

Hesê pirsî:

»Çî ye we şêvir danî ye? Çî ye Werdek?!«

Werdê li wê demê da ko derdikete derva, got:

»Bavo tu bixwe di gel wan biaxive, belkû te karî, tu wan serwext bikî.«

Hesê li nav çavên herdu nebiyên xwe nihêrî û pirsî:

»Çî ye lawên min? Bêjin ka we xêr e?«

Keri got:

»Bavo em dixwazin tu me bişînî mala bavê me. Em dixwazin herin bigîjin babistînen xwe.«

Her çend ko Hesê tişteke wisan ji Xudê dixwest, lê gava ko navê mala

bavê û babistînan bihîst, soromoro bû û li cî da rûnişt. Te şûrek li Hesêyi

143

BILÎCAN

bida, çipika xûnê jê nedihat. Guçkên wî, peleguhên wî, difina wî, eniya

wî, uskura wî, wisan sor bibûn, te digot qay xûn e. Li dilê xwe da got: her

rast gotine, ko golikên xelkê golikben bi dest mirovî va dimîne.  
Ker rabû ber bi wî çû û qesta destê wî kir.  
Hesêyi nehîşt, ko Kerr destê wî maç bike û gotê:  
»Lawo ez taze ji Laleşi nazivirim, ko tu destê min maçê dikî!? Bêjin  
ka  
we xêre? Kê çep li ber guçkên we xwendiyê?«  
Her çend ko Hesêyi tiştekwisan ji Yezdanê xwe dixwest, lê li ber  
kiça  
xwe nedixwest, ko şêvira dîwanxanê li bal wan ser veke. Ewî  
dixwest  
hemaistirînan bi destên wan derîne û wana bike destikê kêrê.  
Dîsan Kerrî bersiva wî da:  
»Bavo êdî em bi hemû tiştî hesiyan e. Werdekê piştî şerê îro hemû  
tişt  
ji me ra ser vekir. Êdî em nikarin li vê derê bimînin.«  
Di gel vê gotinê kela giriyê da qirika Kerrî û bû kûrîna wî û giriya. Bi  
girîna wî ra îskeîsk bi Kuliki jî ket. Li dû wî ra Hesê jî taba xwe neanî  
û  
ew jî giriya. Bi dengê girîna wan ra Kewê û Werdekê cil û bergên  
Silêmanî yên xûnavî anîn û dest bi girînê kirin û şîn danîn. Bi dengê  
şînê  
ra deste deste jin û mêr û kal û pîr li mala Hesêyi da berev bûn û  
piştî çend  
sala, ser ji nû şîna Silêmanî taze kirin.

144 BILÎCAN

Nîveya dûyê, ya duwemîn meha havînê bû. Hîvê şîv xwaribû. Der û deşt,  
kor û kend, çî û gelî, ger û newal, herd û dol, zang û şîkêr li ber ronahiya  
hîvê hatibûn nûrbarankirinê. Heyva çardê bînanî gemiyeke zîvîn,  
gemiyeke giran û tîjî, pir û serêj li nava deriyaya şîne esmanî da, bi aramî  
dilemiya û pêş da diçû. Te digot qay hajoyê wê xew lê ketiye û dihênije,  
yan li ber giraniya barî li ser sîngê deriyaya şîn da ditiltile. Hej û liv û  
tiltîlîna wê bi çav dihate xûyanê. Hindek caran te digot qay li ser şepêlên  
tund ra derbas dibe û wekî taseke tîjî şîr diçelqiya. Li rex û kojên esmanî  
da tek û tûk stêrên bêreng dûr va diçirûsîn.  
Şev dageriyabû. Sê çarêkên şevê bihorîbûn, çarêkek mabû. Heşt hêştirên qenterkirî;  
du ner, du lok, du buxur, nermeyayek û meciyek li  
ber derê mala Hesêyi yêx bibûn. Zaroyên mala Hesêyi xerîk bûn mala  
Silêmanî bar dikirin. Navmalî û cihaz û şikartên Werdekê, konekî çarstûnî  
û xîveta Silêmanî ya taybetî tevî çekên Silêmanî û Werdekê yên  
pehlewaniyê li hêştiran kirin. Taze stêra sibêdê li aliyê rojhelatê da nêzeyekê  
bilind bibû, ko heft siwar bi Werdekê ra li ber derê mala Hesêyi  
siwar bûn. Sê birayên Werdekê, Tajdînê dengbêj, Mîroyê kurê Mela

Heseni, Kerr û Kulik tev siwar bûn. Bi suwarbûna wan ra, bû oreora hêştiran û şîhîna hesp û mehnegiyan. Ca bi wan dengana ra dengê şîn û

girînê li ser mala Hesêyi ket. Bi dengê şînê ra komela zomê li ber derê

mala apê Hesêyi berev bûn. Şîna mala Hesêyi kete nava êlê da jî. Malên

hevhesî yekê li dû yê dî gazî hevdu kirin û hevdu bi barkirina mala Werdekê hesandin. Li maweyeke kurt da civata mêr û jin û qîz û xort û

kal û pîrên zomê li ber derê mala Hesêyi li dora qentera hêştiran û suwarên ko li ser oxirê bûn, çît girtin. Komela zomê bonetî Werdekê û

cotên karxezalan xûn digiriyan. Pîngepînga Hesêyi bû, destmal dabû ber

çavên xwe û digiriya. Te digot qay taze şîna Silêman û Ehmed Begiye.

Dengên got û bêj û şîn û girînê tevî hev bibûn. Werdek ko hema wisan li

ser piştta hespê xwe çik rawestabû, bi dengê ko rehê girînê bi başî tê da

diyar fikir, got:

145

BILÎCAN

»Gelî civata hêja! Ez pir sipasê ji we dikim, ko hûn li vê şevê da bonetî

min lêre berev bûne. Ez tikayê ji we dikim, ko li gerdena min aza bikin.

Ez neçar im. Li min negirin. Ezê dîsan jî bêm û sera we bidim. Ez seriyar

ji ser we naqetînim. Ezê herdu zaroyan jî car û bar bişînim xizmeta hewe.

Li gerdena min belî bikin. Dey bi xatirê we. Malîava komela birêz!«  
Werdekê bi vê gotinê ra dehî hespê xwe kir û komel li ber tîş bû û jê ra

rê vekirin. Qentera hêştiran bi heft Siwaran va dane dû Werdekê û li na-

va zomê derketin û di gel gemya zîvîne hîva çaredeşevî li nava heyveronê

da cûm bûn û ber bi mala tîgelanê Werdekê rêketin. Werdek li seglaviya

Silêmanî siwar bibû. Seglaviya Silêmanî lap pîr bibû. Limozên wê gewr

dikirin. Bijiyên wê lev aliyabûn. Piştî kuştina Silêmanî, ev e cara yekê bû,

ko ling li ser pişta wê diket. Seglaviyê pêş da toratî kir. Lê Werdeka pehle-

wan dizgîna wê berev kir û zengiyek lêda. Seglaviyê xwe berv kir û da rê.

Hindî ko Werdek û hevalên wê bi komela zomê va dihatin xûyanê, komel hema wisan li ber derê mala Hesêyi rawestabûn û li koça Werdekê

dinihêrîn. Werdek jî geh diçû û geh jî dizivirî û li dû xwe ra li zomê dini-

hêrî. Bi her pêngava seqlawiya xwe ra dilê wê giran û girantir dibû.  
Te  
digot qay çengan li dilê wê didin. Dilê wê dişewitî. Destê Werdekê  
ji mal-  
bava wê, ji civata wê, ji heval û hogir û av û ax û welatê wê nedibû.  
Dil  
nedikir ji êl û xizm û kes û karên xwe cuda bibe. Dilê wê pir birîn bû.  
Ketibû nîveka nal û bizmaran da. Dest ji malbaba xwe bikêşe, yan  
dest ji  
zaroyên xwe? Ew waye malbaba xwe di gel hezaran bîreweriyên tal  
û şirîn,  
cî da dihêle û ber bi ciyekî nenas, ciyekî ko li xewina şevan da jî  
nedîtiye,  
diçe. Lê berewajî wê Kerr û Kulik keyfxweş bûn. Li ber şabûna dil  
hebûn  
fir bidana.  
Werdek li pêşiyê û heft siwar û heşt hêştirên qenterkirî jî li dû,  
daketin  
hundurê Zanga Xûnê. Hîveronê der û deşt tijî kiribû. Gava ko  
daketin  
hundurê zangê li ber hurşehurşa ava şurikê bo demeke kurt çi tişt  
nebi-  
hîstin. Li rêka rex avê ra derbas bûn û giheştin zanboqa zangê. Li  
zanbo-  
qê ra bi rêz bihorîn û xwe dane devê hingivokê. Gava ko Werdek li  
ser  
hingivokê ket, li rex Kevirê Hirçê, li rê derket û rê ji siwarên li dû xwe  
ra



û ji hêştiran ra vekir. Gava ko her heft siwar û qentera hêştiran li ber ra

derbas bûn, Werdekê got:

»Lêre rawestin!«

Dengê Werdekê hatibû guhestinê. Gava ko siwar û qentera hêştiran rawestan, Werdekê berê xwe li ser herdu kurên xwe da kir û gote wan:

»Lawo! A, ev dera Kevirê Hirçê ye. Zanboqa Zanga Xûnê jî hemîn hûn

146 BILÎCAN

divê binasin, ev dera ye. A, bavê we û Ehmed Begê Mîr û Miho û Remo

pehlewani li vê derê bi dexesî û xinizî hatin kuştinê. Ta roja îro jî kes nizanê, kanê kîj dexesî ev sosreta giran li ser me da anî.«

Ker û Kuliki nizanîn yê çî bersiva dayîka xwe bidin. Zaroyan ustuyên xwe xwar kiribûn û bi çavên zil, çûr mabûn li kuştinê bavê xwe dini-

hêrîn û nizanîn yê çî bikin.. Tajdînê dengbêj berê xwe li ser Werdekê da

kir û gotê:

»Werdek tu çima wan zaroyana nevehisiyayî dikî? Divê ya ko te qet ew

yeka li ser vê oxirê negota wan.«

Lê Werdekê got:

»Na mamê Tajdîn, zaro gereke bizanbin, ka çî hatiye serê bavê wan û

bavê wan li kî derê û bi destên kê hatiye kuştinê.«

Tajdinî bersiva wê da:

»Tu rast dibêjî, lê li vê dema şevê da, li ser vê oxirê, divê te negota wan.

Te dikarî paşê ji wan ra bigota.«

Lê Werdekê nepejirand û got:

»Na mirovî debê zaroyan bi her tiştî bihesîne.«

Îca bi gotina xwe ra dehî seglawiya xwe kir û kete ser rê. Siwaran dane

dû Werdekê. Werdekê berê seglaviyê ber bi milê çepê, ber bi geliyî zivi-

rand. Jor da li ser geliyî da şiqitîn. Heyveronê bi meqesa reş û ron gelî

kiribû du pirtikan. Sîbera çiyayên milê çepê daketibû ser geliyî û nîvê

geliyî di sîberê da cûm bibû. Koça Werdekê hêdî hêdî li ber sîtavkê dakete jêr siya reşe çiyayên milê çepê. Gava ko daketin hundurê geliyî,

nermebayekî vizandê. Eva bayê sibêdê bû. Aveke zirav li nîveka geliyî ra

berjêr dişûlikî. Dengê zengilê nerê Pêşeng, tevî tembûra dengê avê bibû.

Rêbwar hemû tev jor da daketin biniya geliyî. Geliyekî kûrî dûr, hindî

hesp û hêştir dikudandin û pêş da diçûn, gelî kuta nedibû. Barê hêştiran

li ser piştê wan bînanî hêlikanan dihejîkîn. Bi seûgura sibê ra, gelî li pişt

xwe ra hêlan û bi ronahiya berbangê ra daketin deşteke vekirî. Hindî  
ça-

van didît, deşt ber va diçû.

Li rê da hindî ko Werdekê çil û çî, newal û gelî, herd û dol, girik û  
top-

ik, herde û kulot, raz û rewez, zang û zaxe, kevir û kuçik, der û deşt,  
banî

û bêlan, kêş û berkêş nas dikir, ewan bi herdu kurên xwe ra  
dinasand û

şirove dikir:

A, ew çiyayên hanê çiyayên Çirîşê ye. Ew kevirên hanê, ko serên  
wan li

pişt çiyayê Çirîşê ra tê xûyanê, şargên Qulduran e. Ew pêş da şargê  
rêbi-

ran bûn. Rêbiran dihatin karwanî dişêlandin û li dû ra diçûn li wan  
rizde-

147

BILÎCAN

berane da şarge digirtin. Lê kalkê we Hesê bi çend pehlewaniyan  
mala Mîrî

ve şevê li ser wan da girtin û ew hemû dîl kirin û anîn diwana Mîrî.

Li

dû ra hemûyê li ber destê Mîr û Mela sûnd xwarin, ko êdî dizî û  
rêbiriye

nekin. Mîr jî ewan hemû aza kirin. Li dû wê hindê ra, ta roja îro êdî  
kesî

li van rêkana da rêbir nedîtine.

A, ew rewezên hane bilind, ko serên wan bazorê têne xûyanê, ew jî mex-

elên pezkûviyan e. A ji wê besta li bintara çiyayê Çirîşi ra jî, besta dirîreşkan dibêjin.

Bi vî cureyî ewê zaroyên xwe di gel erdê welatê wan nasiyar dikir.

Werdekê digot:

»Zor pêdiviye ko mirovî erdê welatê xwe bi başî nas bike. Welat dayîk

e. Mirovên bê welat bêdayîkin. Her kesê ko welatê xwe baş nas neke, qet

bila dayîka xwe jî nas neke. Her kesê ko welatê xwe xoş nevê, bila dayîka

xwe jî xoş nevê.«

Koça Werdekê ber bi mala tîgalanê wê dikudand û êwir bi êwir li rê da

li ser kaniyan, yan li guherên ko kûşkê dûrî rêyan bûn, dadinîn û bêhna

xwe distandin.

Êdî ewan cî û warên nas li pişt xwe ra hêlabûn. Ketibûn besteke nenas.

Lê li rê dervediketin û gewriya rê ra girtibûn û dikudandin. Werdekê li

her derfendê wec werdigirt û li rêvîng û rêbwaran, ji kariwanî û şivan û

gavan û revîvanan pirsiyara rê û dirban dikir. Werdekê digot: Mirov bi

pirsiyaran digîhêje cî û waran.

Piştî çendîn êwirgehan şeqî û mandî li toz û gemarê da vemaî, xwe bi

zozanên bilind ra gîhandin. Li devê geliyekî kûr da rastî karwanekî hatin.

Karwanekî giran, pêk hatî ji dused, sêsed gayên barbir û hesp û hêstir û

hêştiran. Werdekê seqlaviya xwe zengî kir û ber bi wî karwanî çû. Silav li

serekê karwani kir û paşî xoşbêjiyê, pirsiyara mala Emer axayî jê kir. Serekkarwanî du, sê caran navê Emer axayî li ber xwe da anî û ridêna

xwe xurand û got:

»Hûn divê ko li wî geliyê hêstirkoji ra derbas bibin û li çiyayê hanê ra,

a... ew çiyayê hanî serkever ra ko dibêjinê karwanbizdîn, derbas bibin. Li

piştî wî çiyayî deşteke vekirî ye. Hûn ko daketin deştê, hûnê rastî çemekî

boş bîn. Hûn ko li çemi ra derbas bûn, wî alî çemi kewşenê êla Emer ax-

ayiye. Lê debê hûn xwe li gêdûka wî çiyayî, çiyayê karwanbizdîn baş bi-

parêzin. Bagera wî çiyayî havîn û zivistan her berdewam e...«

Werdek û serekê karwanî li axiftinê da bûn ko pêroyên herdu destê li

hev asê bûn û li hev qelibîn. Hindik mabû, ko koça Werdekê li nav xûlê

148 BILÎCAN

hêştir û revoyên hesp û hêstiran da bezir bibin. Tajdînê dengbêj bi hevalan va xwe dane pêşiya koçê, ta ko kariwan li ber wan ra kişiyên û ku-  
ta bû, paşê ewan daketin ser rê.  
Rê li hundurê geliyê ra derbas dibû. Li ber devê geliyê rê zirav û teng dibû. Bintara rê kendalekî kûr bû, ko lêkendê lê dabû qelaştibû û deh,  
danzdeh gazan kûr kiribû. Binê kendalî tijî bû li hestikên hesp û hêstiran.  
Li fêza rê da jî durust li hemberî wî kendalî zinarekî bilind bi bilindaya  
bîst sî gazan ber bi pêrê esmanî hilkişiyabû. Kevirê wî zinarî kevirên reşe  
pirxonekî bûn. Li ber ba û baranê, carê kevirek jê diqoqilî û girêlî binê  
gêliyê dibû. Ca eger li wê demê da rêvîngek yan kariwanek li wir ra der-  
bas biba, li derbên pangewêran rizgar nedibûn. Koça Werdekê bi hem-  
met li binê zinarê reş ra ketin hundurê geliyê hêstirkoj. Berî nîvro bû, ko  
berê xwe dane geliyê hêstirkoji, êvarê ra li ser geliyê ketin û li pêşîra çiyayê  
kariwanbizdîni ra derbas bûn. Rêka pêşîra çiyayê karwanbizdêni wekî  
pêlekenan bû. Werdek kete pêşiyê û yê dî dane dû wê û li ser kevirên

pêlekenkî ra bi hemmet derbas bûn. Gava ko gihîştin serê qûça çiyayê kariwanbizdînî, ba û bagerê dest pê kir. Bayekî hind tund divizandê, ko dil hebû Siwaran ji xana zîni rake û bavêje erdê. Bi lez û bez li serê qûçê ra daketin aliyê dî. Her alî çiyayên bilind û serkever dihatin xûyanê. Li nava rizdeberekî şîn ra derbas bûn û berê wan kete serberjêrekî tund. Bi hezar êş û azaran va li wî berjêrî ra daketin binê deştê. Çemekî giran li naverasta deştê da bi çivane weke marekî birîndar li ba dibû û ber bi binê deştê layê rastê dişûlikî. Tarî ketibû erdê, ko xwe gîhandin rex wî çemî. Li wî alî çemî êleke giran, ko çî ji êla Mîr Elî Siwarani nedima danîbû. Koça Werdekê wê şevê li rex çemî êwirîn û herdu birayên Werdekê yên mezin wê şevê ta sibêdê bi gered zêrewanî kirin. Bi lédana tavê ra, Tajdîn û Mîro û her sê birayên Werdekê, mala wê li hêştiran bar kirin û ew û cotên kuran va ta ber devê çemî anîn û li wê derê bi çavên şil û dilên kul malavayî ji hev kirin. Çunku Mîr Elî Siwarani li ber kuştina Silêmanî, sipartibû wan, ko neçin nava êla Emer axayî.

Hevalên Werdekê piştî malavayiyê dîsan ew riya ko tê ra hatibûn,  
dane

ber xwe.

Koça Werdekê jî ji çemi derbas bû û ber bi êla Emer axayî lipitî. Tav  
şirîn bibû, ko koça Werdekê xwe da biniya malan. Koç hêdî hêdî û  
melûmelûl ber bi konan diçû. Werdek li pêşiyê bû û Kerr û Kulikî jî  
xwe

dabûne dû qentera hêştiran. Koçê nêzîkî bi êlê kiribû, ko mirovik ji  
nav

konan derket û hate pêşiya wan û pirsî:

149

BILÎCAN

»Xûşkê pirsiyar bêxewşe. Hûn ji kû tîn û hûnê kû da herin?»

— Eva mala Silêmanê Silîvî ye. Ew herdu yên hanê jî kurên wîne. Em  
hatine bigîjin Emer axa û Mamê Îsi.

— Mala Silêmanê Silîvî?!

— Erê, mala Silêmanê Silîvî.

Peya bi guj ji bal wan ber bi mala Emer axayî zivirî.

Koçê xwe dabû nav malan. Werdek li ber serê nerê Pêşeng  
rawestabû,

ko gultegulte xelkê zoma Emer axayî li ser serê wan da berev bûn.

— Kuro dibêje mala Silêmanê Silîvî ye.

— Kuro zû mizginiyê bidin Mamê Îsi, bêjinê zû were Silêman hat.

— Kuro lê Silêman ta niha li kêderê bû?

— Kuro me cîhan têk da, me ew nedît. Dîsan baş e waye bixwe  
hatiye.

Werdê jî hema wisan bêdeng û seda li pêşiya hêştiran rawestabû, û



nedihîşt hêştir pêş da herin. Kerr û Kulik jî li ser pişta hespan li dû  
koçê

rawestabûn.

Kalemêrekî pişthoçik serqut û pêxwas ew civata ko dora koça  
Werdekê

ra çît girtibûn, jêk tîş kir û bi pelepel pirsî:

— Ka Silêman? Ka Silêman?

Werdekê, hema wisan li pêşiya hêştiran rawesta yî, got:

— Ez xîzana wî me. Ew herduyên hanê jî kurên wî ne.

— Lê ka Silêman?

— Ew herduyên hanê kurên Silêman in.

Li wê demê da Kerr û Kulik li nava koma mirovan da, ji hespan peya  
bûn. Mamê Îsi xwe bi wan ra gîhand û herdu kurik himêz kir û  
ramûsî û

pirsî:

— Lê ka bavê we? Lê ka Silêman?

Herdu zarok bédeng man. Mamê Îsi li ser Werdekê da zivirî û bi  
pele-

pel pirsî:

— Lê ka Silêman ? Lê ka Silêman?

Serê Werdekê li ber da, got;

— Serhatî dût û dirêj e. Ezê ji we ra bi hûrgilî şirove bikim.

Li dû wê gotina Werdekê ra Mamê Îsi li pêşiya wan ket û tev çûne  
nav

malan. Çend mêran rahêlan hêştiran û hêştir yêx kirin û barê wan  
vekirin. Werdek û Kerr û Kulik tevî gulta mêt û jinan çûne mala

Mamê

Îsi. Li gavekê da hundurê konê mala Mamê Îsi ji komelê pingirî.

Werdekê keserek kûr rahêla û serhatiya xwe û Silêman û cotên kuran bi

hûrgilî ji wan ra şirove kir. Pîngepîng kete hundurê konê mala Mamê Îsi.

150 BILÎCAN

Şîn û şayî tevî hev bibû .

Mala Werdekê li rex mala Mamê Îsi danîn û konê çarstûnî û çadira Silêmanî ya taybetî li rex hev vegirtin.

Şîn û serexoşî taze kirin. Dîtin û serlêdan dest pê bû.

151

BILÎCAN

19

Îsê Mîrî, mamê Silêmanî lap kal bûye. Ridîna wî ya çîle kever dadikeve

ser çokan. Pişta wî xwar bûye, bûye gopal. Êdî ew gencê ko dilê qîz û bûk

û zeriyan li ser dixeriqî, bûye kalemêrekî pişthoçik. Yek kiriye du, du kiriye sê. Dûr nêzîk kiriye. Guçik lê giran bûne. Gelek caran gava ko bixwaze ji cî rabe, bixwe nikarê, gereke bi milên wî ra bigirin û ewî ji cî

rakin. Ew bejin û bala şûşman bûye gopal. Çemiyaye. Ridîna wî tu dibêjî

qay lûfikek pemboyê veçirandî ye. Cotên birûyên wî ko li dema lawîniyê

da weke perên reş dalaşan diteyîsîn, niha weke du kuliyên berfê lê hatine.

Ew gelekî zû pîr bibû. Pîrbûneke ne li demê da lê ser dabû. Hindekan digotin, ko mamê Îsi kula bav û bira û biraziyê xwe kire dilê xwe, lewra weha zû pîr bû. Hindekan jî digotin, ko jinka wî Xecîc li xeberdaniya wî da nîne, lew ra. Her yekê tiştê digotin. Îsê Mîrî li temenekî hindik da bibû kalekî helêlî. Lê berewajî wî Emer axa roj bi rojê genc û gencîr dibû. Di gel vî halî dîsan çawa be, gereke Îsê Mîrî rojê danekî here dîwanxana Emer axayî. Qet nebe hema rojê danekî, here ber derê dîwanxanê û li ser piyan ji Emer axayî bipirse, ka çi kar pê tune ye û paşê bizivire mala xwe. Emer axa wisan nîşanî komelê dide, ko giştî kar û barên dîwanxanê bêy şêvra Îsê Mîrî nabe û naqede, û ew li xeberdaniya Mamê Îsi der-nakeve. Lê ya rastî tiştêkedî bû. Ji layekî dî va Emer axayî kurê Mamê Îsi, Neimet ko xwarziyê wî ye, ji xwe ra kiriye berdestk. Neimetê Îsi tim û tim li dîwanxanê da ye. Giştî karên dîwanxanê, ji nanê mêvanan bigire ta qawe û cî û nivîn û pejiran-dina giştî û hat û çûya mêvanên derekeyî li destê Neimetî da ye. Bi kurtî ew bûye berpîrsê kar û barên dîwanxanê yê pejirandinê.

Neimetê Îsi li nav mala Emer axayî da destûrdayî ye. Ew xwarzayê  
ax-  
ayî ye û mehremê mala wî ye. Her tenê ew dikare here aliyê malê,  
nava  
jin û zaran. Ew dikare destûra xwerekê bide. Ew dikare çavên xwe  
li  
heremseraya Emer axayî bigerîne. Gel heremên wî biaxive û heylo  
yarî û  
laqirdiyan jî bike.  
Neimetê Îsi sî salên xişt li pişt serê xwe ra hêla ye. Ew yekî pixtikî,  
152 BILÎCAN

kudûz û bejinbihostî ye. Çi kes salixan nade, ko yekî li bejin û bala  
wî da,  
li qeyafetê wî da, li nav binemala wan da hebûye. Ustuyê wî wisan  
kurt e,  
mirov dibêje qay serê wî li nîveka herdu milên wî da gîr kiriye û nîvê  
wî  
maye û hê derneketiye. Cotek çavên zeregir li bin eniya wî ya  
gocgoce da  
bera mirovî li ser xwe da radikişîne. Cotek çavên zeregir, tu dibêjî  
qay  
cotek çavên kundane, ko bi dest di korika çavên wî da çandin e. Li  
ser wê  
kudûzî û bejinbihostiya xwe ra, yekî çarşanî, qelewî bi zend û bende  
jî.  
Her tipileke wî weke çiqileke pîredarên palûtê kurt û stur û  
hişkolekîne.

Li ser vê demê ra Neimetê Îsi mêrê du jinan e jî. Lê ewî bixwe her dem  
li bereviya heval û hevtemenên xwe da digot, ko herdu jin jî bi dilê wî  
nînin. Yek hê ew gencekî tazegiheştî bû, hê tişteki ji zewacê nedizanî, bavê  
wî jê ra xwestibû. Ya dî jî Emer axayî li wî bar kiribû. Emer axayî gotibû:  
Neimet! Here min kiça Evdalî da te. Êdî ewî jî, neşiyabû bêdiliya Emer  
axayî bike. Nekarîbû gotinekê li ser gotina Emer axayî ra bêje. Eger big-  
ota na xalo, ez naxwazim, dê li ber çavên xalo biketa. Dê li ber çavên Emer axayî reş biba. Êdî destên wî yê ji guliyên daran biqetiya. Êdî piyên  
wî yê ji dîwanxanê û heremserayê bihata birînê. her bi gotina Emer axayî  
ra şandibû xazginî û kiça Evdalî ji kîsî xalê xwe ji xwe ra anîbû. Lê her li  
yekimîn şeva zewacê da, her li şeva zavatiyê da, ava wî û Seyrê li cowekê  
da neçû ko neçû. Her li şeva zavatiyê da bibû gêra wî û Seyrana Evdalî.  
Ca xelkê li vê barê da gelek gotinên cur be cur digotin.  
Hindî ko neimetê Îsi bibû mêrê du jinan, kêr diçû mala xwe. Gelek şevan bi hecetên cur be cur li dîwanxanê da dima û li bal qawegerînan li

goşeyek dîwanxanê da carcimek li serê xwe dialand û radiza. Îca li ber

rûyê xwe da digot, wakî ez li bal qawegerînan nemînim, qawegerînan neşên

baş kar û barên dîwanxanê û amadekirina qawê cî bi cî bikin. Ez neçarim

li bal wan bimînim.

Lê xelkê li bara wî da hindek tiştên dî digotin. Digotin, ko jinên wî serî

li ber dananên. Jê ditirsin. Şev neşên di gel da bihewin. Ji qeyafetê wî di-

tirsin. Ji bejina wî ya kudûz û ji çavên wî yên bûmikî ditirsin. Her yekê li

bara wî da gotinek digot. Pişka zore wan gotinan jî dijî hevdu bûn. Her

çend ko Neimetê Îsi li panzdeh saliyê da zewicîbû, lê ta roja îro hê jî nebibû xudanê biçûkekê. Ew bê ewled û bê tewled bû. Li ber vê hindê

Neimet dîsan jî her çavên xwe li jinikan digerand. Dîsan jî her li hizra jinînanê da bû, da ko kurdûnda nebe.

Lê devê xelkê doxîna şalê mirovî nîne, ko mirov girê bide. Xelkê li bara

bêzarûtiya Neimetê Îsi da jî hindek tiştên dî digotin. Ewan digotin

153

BILÎCAN

Neimet xurgun e. Hegera bêdûndatiya wî, her ji wî bixwe ye. Ji Neimet

bixweye, ko biçûkê wî nabe. Çawa heba, hema ji du jinan yekê ber bigir-  
ta, yekê pê bima. Li herdu jinikan her yekê duhala biba. Guneh li stuyê  
gotiyan be, hindekan jî digotin, ko herdu jinên wî jî hê kiçin. Digotin eva  
jina wî ya mezin, Xemê gotibû. Heylo wê salê, dema ko bibû şerê Neimet  
û Xemê, û Neimeti li Xemê dabû, serê Xemê li du ciyan da şkandibû,  
Xemê bi xûna serê xwe va, li wê demê da ko xûn bi xavik û fîstanên wê va  
rêz bibû, bi dujûn û kirêtiyên ne li rê, ji mala wî derketibû û xwestibû  
here mala bavê xwe. Hînga Xemê gotibûyê, tu çima mêrî. Wekî tu mêr  
bay, çima ez ta niha kiç dimam.  
Dema ko Neimeti ev gotinana ji devê Xemê bihîstibû, dabû xencera xwe û rikêfî ser Xemê kiribû, ko bikuje. Lê navmalî û berdestkan xwe avîtibûn nîvekê û nehêlabûn. Xemê jî qet ji ber wî nerevîbû. Hema wisan  
li ber rawestabû û dujûn û gotinên ne li rê li wî bar kiribû. Neimeti xwe  
li nav destên rêncber û berdestikan da çirçirandibû. Lê nekarîbû xwe li  
nav destên wan da derîne. Ta ko hawarî dabûn Mamê Îsi, û Mamê Îsi  
xwe pê ra gîhandibû, sexera Neimeti biribû û li ber Xemê geriyabû û ew

aş kiribû. Mamê Îsi bi milê Xemê ra girtibû, û ew biribû xîveta xwe  
û bi  
destên xwe pîşo çêkiribû û danîbû ser birînên serê Xemê. Li dû ra  
xeka  
şekiri li ser pîşo reşandibû û serê Xemê dabû girêdanê û ew li xîveta  
xwe  
da razandibû.

Hindî ko ew şera qewimiye, Neimet gelekî kêr diçe mala xwe. Êdî  
ewî

kîna Xemê kiriye dilê xwe. Gava ko xeber tê li ser xeberê, dibêje:  
»Xemê jineke zarçors û xebersar û zimanreq e. Ez hejî wê nakim.  
Seyran jineke baş û bi toreya. Jineke ziman qend û zarşirîne. Jineke  
dil-  
hebîne.«

Lê xelkê digotin:

»Qet Seyran jî çî rûyî nade Neimeti. Ew jî ji Neimeti direve. Jê ditirse.  
Keyf pê nayê. Lê herdu jî darên şkestî e. Nikarin tişteke bikin. Ne  
dikarin xwe bidin berdanê, ne jî dikarin li dijî deb û şopên heyî  
bilivin.

Neçarin hema temenekê li wî agirî da bimînin û bişewitin.«

Lê hindê jî dibêjin ko Neimeti li mala xalê xwe da tişteke diye,  
lewranê

dil nade ji mala xalê xwe dûr bikeve. Erê li mala Emer axayî da, li  
pişt çît

û perdan da, li heremseraya taybetî da, kiçek heye. Ca kiç, çî kiçe!  
Kiç

wekî hûrî û periyane. Ev kiça ciwan û xweşik, ev canika nazenîn, ko  
dibê-



je hîvê tu dernekeve, ezê derkevim, tavê tu dernekeve, ezê derkevim, kiça

Emer axayî ye. Navê wê Perîşan e. Perîşan bînanî çirayekê vêdikeve.

154 BILÎCAN

Xanimeke ji xwe zêde ye. Perîşan hê nebûye çarde salî, hê zaro tê hejmarê,

lê nav û deng belavî cîhanê kiriye. Li ser bedewetiya Perîşanê ra kiç neha-

tine cîhanê. Ca di gel vê ciwanetiyê Perîşan kiçeke pir toredar û têgihêştîye jî. Qewlî gotî xeber bi misqalê ji devê Perîşanê ra derdikeve. Perîşan ko dimeşe, tu dibêjî çîlkewa çiyayê Elegezê ye. Mirov dil nade

çavên xwe li ser wê û rewta wê hilîne. Bejina wê bilind û navtenga wê bi-

hostek û çar tilî ye. Çavên wê weke qetrana Kewanê Qîrê reş û zîlin. Birûyên kewanî, eniya meydanî, sûretê sore sipî li para va têne xûyanê.

Xaleke angorî nîskeke jî li ser hinarikê rûyê wê yê aliyê çepê da ye. Xal

wisan sore, tu dibêjî çipika xûnê ye. Perîşan wisan nazik û nazenîne, ko

av li gerdenê da û mejî li tiliyan da tê xûyanê. Tu dibêjî qay Xudê giştî be-

dewetî û ciwantiya li ser rûyê cîhanê kiriye du paran, parek daye giştî

cîhaniyan, û parek jî daye Perîşanê tenê. Kê dibîne, hişê xwe ji dest dide

û mit û mat dimîne û li wê û ciwantiya wê dinê re. Ta hînga gelek  
xort li  
ser bedewetiya Perîşanê dîn û şê û şeyda bibûn. Lê newêrîbûn ewê  
li bavê  
wê bixwazin. Emer axa êdî bibû Mîrê navçê. Tenê Mîran dikarî dawa  
kiça wî bikirana. Nav û dengê Perîşanê balavî axarê cîhanê bibû.  
Navê wê  
bibû pirzika li ser zimanê gelek xortên tazegiheştî.  
Hindî ko Perîşanê nav û deng belavî cîhanê kiriye, Neimet zêdetir  
diçe  
aliyê malê. Carê bi berhaneya tiştekiçe aliyê malê. Carê  
kêmasiyeke  
qawexana dîwanxanê dike berhane û diçe heremseraya xalê xwe.  
Kilîdên  
kîler û qotiyên xwarebarê hemû li destê Perîşanê da ye. Neimet her  
gava  
ko diçe aliyê malê tişteki bîne, du tiştan ji bîr ve dike û dîsan dizivire  
aliyê  
malê. Li ber Perîşanê radiweste û bi zimanekî pelte û lalome pê ra  
xeber  
dide û kêmasiyên qawexana dîwanxanê jê dixwaze. Şekir, qend,  
qawe,  
fîncan û feyfûrî, karê şiv û firavîna mêvanan...  
Lê Perîşan qet aviran jî nade wî. Dike pêkenîkê keniz û kulfet û  
berdes-  
tikan. Hindî ko Perîşan bi wê rewşa Neimetê Îsi, kurmetê xwe,  
hesiya ye,

nav li kenizan da ye, wî ya dikin tirane. Yên ko kumê wî direvînin.  
Yên

ko pişta wî dişiqitînin. Yên ko devên xwe lê xwar dikin. Yên ko tiştan  
davêjin ber piyên wî û ewî li ser kelle li erdê didin. Li demên weha  
da,

Perîşan diroda xwe li carî û kinizan tûre dike û dibêje, çi karên we  
bi

Neimetê metê neketibe.

Hindî dem li ser ra derbas dibe, Neimet zêde û zêdetir evîna  
Perîşanê li

nav dilê xwe yî pir kul û birîn da dinitilîne. Ta ko rojekê taba xwe  
nayîne

û dibêje kenizekê:

»Bêje xanima xwe bila min bike!«

155

BILÎCAN

Bi vê gotinê ra keniz hemû lê berev dibin. Komê wî direvînin. Şalê  
wî

dişiqitînin. Şûtika wî vedişêrin. Neimet bi neçarî serqot û bêşûtik  
dizivire

mala xwe û kumê xwe yê dî dide serê xwe û şûtika xwe ya dî  
girêdide û

dizivire dîwanxanê.

Dû vê kiriyara kenizan ra, Neimet êdî ji Perîşanê bêhîvî dibe. Çunku  
dibîne, ev e reftara kenizan bû, lê xanimê çi bîne serê wî? Xwe ji  
xwe ra

dihizire û digîje wê akamê, ko qet li wê bareyê da çî tiştî ne bêje û  
ne jî

tişteke helêxe. Êdî piştî hînga ne Perîşanê rû dida Neimeti, ne jî rûyê  
Neimeti digirt, here aliyê malê . Ew zor kê m diçû heremseraya xalê  
xwe.

Ta Emer axa ew neşanda aliyê malê, ew bixwe nediçû. Ewî êdî gizên  
xwe

ji Perîşanê zîtibû. Lê di gel wê hindê dîsan jî her evîna Perîşanê li  
kûraniya

dilê wî yê pir kul û birîn da mabû.

Hindî ko mala Werdekê hatibû, li rex mala wan danîbû, ewî dest ji  
Perîşanê kêşabû û teşî li ser Werdekê da dirîst. Werdek ji wî ra  
pariyekî

germ û nerm bû. Bi zewaca di gel Werdekê ra ewî dikarî cotên kurên  
wê

jî bikira berdestkên xwe û çawa dilê wî bixwasta, wecê ji wan herdu  
kurikana vergirta. Her cara ko ber bi Werdekê diçû, xwe dikenand  
û di-

danên xwe beş dikir. Gava ko çav li Werdekê diket, xwe dibişirand.  
Lê

Werdekê her li yekimîn carê da, ko Neimeti bi wate lê nihêrîbû,  
avirekî

wisan tûj dabû Neimeti, ko hindik mabû Neimet derpiyê xwe zer  
bike.

Lê Neimeti dîsan jî dest ji Werdekê nekişandibû. her şev û roj li wê  
hizrê

da bû, ko çawan li Werdekê bibe xudan?

156 BILÎCAN

20

Dîtin û serlêdan, şîn û girîn, şayî û keyfxweşî, serexweşî û hawariya mala

Silêmanî mehekî zêdetir kişand. Ta du, sê mehan mala Silêmanî mêvan

dihate hejmarê. Giştî êla Emer axayî bi gered li ser zarên Silêmanî mê-

vandarî danîn. Piştî hemûyê mala Emer axayî jî gazî Werdekê û herdu

kurên wê kirin. Werdek tevî jinan çû aliyê malê. Kerr û Kulik jî dane dû

Mamê Îsi û çûne dîwanxanê. Mamê Îs gopalê wî li desti da, dakete hun-

durê dîwanxanê û li ser deba Kurdî ya mêjîn, bi zimanê kal û bavan we-

ha wîştande komelê:

»Ij we ra wîşt gelî komela hêja!«

Bi dengê Mamê Îsi ra bû gurîna hemûyê ji ber wî va rabûn. Berê Emer

axayî û li dû wî ra jî komelê bi hev ra li Mamê Îsi zivirandin:

»Wîştta te li ser wîştê be, day û babên te li bihîştê be!«

Emer axa hate pêşiya Mamê Îsi û bi milê wî ra girt û ew bir û li rex xwe

da rûniştandinê. Kerr û Kulik jî li rex Mamê Îsi li ser çokan rûniştin.

Pêş

da Emer axa serçawanî da Mamê Îsi û li dû ra jî komelê hemûyê bi wateya

rêzlêgirtinê destên xwe ji Mamê Îsi ra bilind kirin.  
Dîwanxana Emer axayî hê li ser dîwanxana Mîrê ereban ra bû.  
konekî  
reşî Erebbî li ser çil ustûnan vegirtibûn. Ustûnên konî hemû  
gircîkarîkirî  
bûn. Bîneyên karxezal û balindên cur be cur li ser ustûnan  
nitilandibûn.  
Nava koni, li vî serî ta serê hanê bi kulavên Xurestanî hatibû  
raxistinê.  
Bîneyên şêr û piling û bebiran li ser kulavan kişandibûn. Dorandorî  
kulavan palgî û bistir û berpâlên rengrengî li ber hev da hilcinîbûn.  
Nîveka konî li ber deri ta serê jorê li rêzekê da curinên mermerîn  
danîbûn. Kevirên curnan ji mermera sipî bû. Her curnek hindî  
coniyekî  
bû. Bertiraşan nîveka wan hindî beroşekê kolabûn. Kerr û Kuliki taze  
curin didîtin. Kuliki li nav çavên Kerrî nihêrî. Kerr çav li Kuliki kir, ko  
xwe li ser va nebe. Bi hejyareya Kerrî ra Kuliki serê xwe kire ber  
xwe.  
Emer axa li ser doşikek taybetî, ko bi mexmerekî pîrozeyî hatibû  
rûkir-  
inê û dorandorî wê jî bi qeytanên gulavtûne rişîdar hatibû kobe  
kirinê,  
rûniştibû. Doşeka wî du bihostan li ser doşk û kulavên dî diket.

157

BILÎCAN

Komelê li her bareyê da diaxiftin. Ta ko xeber hate ser Kerr û Kuliki.  
Emer axayî ji Mamê Îsi pirsî:

»Ev herduyane nebiyên ten e?«

— Erê, xulamên ten e.«

— Yezdan ji te ra bihêle.

— Zor sipas!

— Çend salî ne?

— Îsal pê dikotin neh salîtiyê.

Herduk jî?

— Erê herduk jî.

— Aha bêje, da, hevalcêvî ne!

— Erê hevalcêvî ne.

— Çavê Xudê li wan be! Çi gir û gevde ne jî!

— A, kişandine dayîk û babên xwe.

Bi wê pirsiyara Emer axayî ra qur û pist kete nava komela dîwanxanê

da û hemûyê zendegirtî li Kerr û Kuliki nihêrîn. Li dû ra Emer axayî dîsan got:

— Te baş kir, ko te ewan jî di gel xwe îna dîwanxanê.

— Erê min got, bila bên û çavnasî dîwanxanê bibin.

— Nebiyên te çi karî dizanin?

— Xudê zor zîx in. Bi min wereng her kar ji destên wan tê. Lê hindî ko

hatine vira her bêkar mane. Bi dîtina min divê, ko destên wan bi tişteke-

va bend bikin. Genc in, bila bêkar nemînin. Helbet dewlet serê te, rewşa

wan pir baş e. Pirêze û pergala mala wan zor bi ser û ber e. Çi tiştên wan

kêm nîne. Lê herwekî min got divê em destên wan bi tiştekekê va bend

bikin. Bila bi tiştekeva xerîk bin û bêkar nemînin.

Emer axayî ko ta niha bi wan herdu gencana ra xeber nedabû, serê xwe

li ser wan da kir û pirsî:

— Hûn çi karî dizanin.

Keri bersiv da :

— Tu çi bêjî.

Mamê Îsi xwe kenand û got:

— Rast dibêje, bi Xudê kem her kar ji destên wan tê. Lê xoşina wan zor

bi hespan ra tê.

Emer axayî got:

— De wisan be, lap baş e.

Paşê serê xwe li ser herdu lawan da kir û pirsî:

158 BILÎCAN

— Hûnê bikaribin revoya hespan biçêrînin?

Keri bersiv da:

— A, emê bikaribin.

— De baş e karê xwe bikin û hema sibê herin ber revoya hespan.

Kanê

hûn çawa hespan biçêrînin?

Keri li nav çavên Kuliki nihêrî û herduyan bi hev ra gotin:

— Baş e! Emê sibê herin ber revoya hespan.

Li dû got û bêjê ra qawegerînan qawe gerandin. Komelê jî li her alî di-



axiftin. Digotin û dikenyan. Li dû qawê ra firavîn hat. Berdestikan  
sênîyên sawarê dabûne ser destên xwe û li dû hev ra hatin hundurê  
konî  
û sawara dax berdane nav curnan û zexmên goştên karikan danîne  
ser  
sawarê û her curnekî jî şeşek nan danîn ser û kûzîkek dewê tirş bi  
çend  
kasikan va jî danîne rex wan û paş da vekîşyan. Hulmeke germ wekî  
ar-  
mûşî ji sawarê dikîşya. Berî hemûyê Emer axa hate ser curnê  
pêşberî xwe  
û li dû ra tekîfatî bi komelê da. Komel weke pezên bêxwedî kişiyane  
ser  
curnan. Mamê Îsî niqande Kerr û Kulikî. Bi niqandina wî ra Kerr û  
Kulik tev rabûn û hatin li rex curnê pêşberî xwe rûniştin. Ewan û  
Mamê  
Îsî pêkve li rex curnî rûniştin û xerîkî xwarinê bûn. Kerr û Kulikî  
bêpakî,  
bi dest û pencên xwe goştê karikan hincîhincî dikirin û davîtin ser  
sawarê  
û parî lê badidan û dixwarin. Hindî pirtiya goştî li binê curnan da  
mabû,  
xwarin. Komelê xwerekî xwe li bêdengiyê da xwarin. Piştî wê hindê  
ko  
hemû ji ser curnan vekîşyan, berdestikan legenî û lûleheng li ber  
komelê  
girtin. Hindekan destên xwe şostin û hindekan jî neşûştin. Li dû

destşûştinê ra berdestikan pêş da ew xwerekî ko li binê curnan da mabû,

derînan û paşê binê curnan temîz şoştin û bi perû yê taybetî binê wan

hişk û paqij kirin. Li dû ra dîsan qawe gerandin.

Piştî xwarin û vexwarinê Mamê Îsî malavayî ji Emer axa û rûniştîyên dîwanxanê kir û ji dîwanxanê derket. Kerr û Kulikî jî dane dû wî. Vê carê

Mamê Îsî rêka xwe nêzîk kir û li piştî dîwanxanê ra li ber derê konê aliyê

malê ra zivirî. Perîşan bi koma kenizên xwe va li ber derê konê rawestabû.

Gava ko çavên Perîşanê bi Mamê Îsî ket, berbirî wî hat. Mamê Îsî serça-

vanî û keyfxweşî dayê û gotê:

»Tu çawayî kiça min? Başî ?«

Perîşanê destê xwe yê rastê da sîngê xwe û zor li ser hemdê xwe bersiva

wî da:

»Ez keniza te me. Destên te radimûsim.«

— Meta te wan çûne, yan hê li malê ne ?

159

BILÎCAN

— Ewan jî her taze çûn.

Ker û Kulik jî li rex Mamê Îsî rawestabûn. Li wê navê da her carekê tenê

çavên Kerr û Perîşanê li hevdu asê bûn. Tirîşka çavên Kerrî weke

birûskekê li nav çavên Perîşanê ket. Perîşana ko pakî ji kulê jî nedigirt,  
bêy hemdê wê serê wê kete ber da. Rehekî sor li binçena wê ra dest pê kir  
û ta ser hinarkên rûyê wê liviyan. Germayeke taybetî li seranserî leşê wê  
geriya. Rengê wê sor bû. Kerr jî soromoro bû û serê xwe berda. Êdî Perîşanê nîkarî gotinên xwe bidomanda, ji wan veqetiya û xwe avête  
hundurê koni. Mamê Îsi jî herdu genc di gel xwe ta ber derê xîveta wan  
anî û li ber derê xîvetê bangî Werdekê kir û doza revoyê ji Werdekê ra jî  
helêxist. Werdekê jî ew babeta pejirand. Ewê jî nedixwest zaroyên wê  
bêkar li nava zomê da arode bigerin. Ew ji dupatebûna şerê li navêla Mîrê  
erebani ditirsiya. Digot cotek mêr in bila herin hem ji xwe ra xerîk bin û  
hem jî hîmî çil û çiya û ber û bestan bibin. Yê çî bînanî qîza kor li mal da  
bimînin. Eger li mal da bimînin, yê dîsan teşqeleyan derînin.

160 BILÎCAN

21

Seûgora sibê bû, ko Werdekê herdu lawên xwe ji xewê rakir.  
Hebana

nanê wan da destên wan û ewan ber bi mala Emer axayî rê kir. Kerr  
û

Kulik ew herdu gencên nûriste, ew herdu şênekurên zîx, ew herdu  
xortên

çeleng di seûgora sibê da, di gewratiya berbangê da, di şefeqa  
siherê da, ji

konê xwe derketin û ber bi mala Emer axayî çûn. Werdek jî li ber  
derê

konî rawestabû, li herdu kurên xwe, li herdu xortên tazegiheştî, li  
herdu

fîdanên nûriste, li herdu şimşadên serferaz mêze dikir û li ber xwe  
ra diçû

û şa dibû, ko dayîka cotek kurên weha çeleng e. Werdekê li ber derê  
konî

destê xwe ji wan ra hejand û got:

»Herin min hûn siparitine Yezdanê mezin. Destê Xudê li ser serê we  
be. Şems agehdar û piştewanê we be. Mîrê mezin we ji aşîtên nedîtî  
bi-

parêze. Herin!«

Her çend ko Werdek pehlewanake jîr û jêhatî û bêtirs bû, lê pir di  
xe-

ma cotên kuran da bû. Pir li wan û li paşeroja wan û bûyerên  
buvedar di-

tirsiya.

Herdu xortan bi hev ra bersiva dayîka xwe dan û gotin:

»Bi xatirê te dadê! Nihêranî me nebe!«

Ta herdu zaroyên wê pê va dihatin xûyanê, Werdek hema wisan li  
ber

derê konî rawestabû û li wan dinihêrî. Da ko Kerr û Kulik giheştin ber

derê mala Emer axayî, paşê Werdek çû kete hundurê xîveta xwe.

Ker û Kulik gihîştin ber derê mala Emer axayî û meyteran alî wan kirin

û derê extirmexanê vekirin.

Bi darên çamê perjîneke mezin ji hespan ra çêkiribûn. Deriyek jî pê qamûşan girêdabûn û li ber dergê extirmexanê dabûn. Gava ko meyter-

an derê extirmexanê vekirin, bû fîrefîra hespan û hevdu paldan û xwe lêk

dan û hevdu dane ber çifte û refes û qerpan û bi gultetî li derê extirmex-

anê ra derketin derva. Bi derketina hespan ra bêhna tersan da hewayê. Bû

hîrehîr û şîheşîha wan. Meyterekî alî Kerr û Kuliki kir û revo ber bi lew-

ergehê rast kir û pawana hespan nîşanî wan da û got:

»A, ew mila hanê hindî ko bi we va tê xûyanê, ta binê geliyê pêşberî we

161

BILÎCAN

qorixa hespaye. Hûn dikarin her roj revoyê li wê milê ta biniya geliyê bilewerînin. Lê nebî, nebî ku, hûn li wî girê reş derbas bibin. Piştî wî girî

êdî kewşenê me nîne. Ew derana kewşenê êla Denizê diz e. Van salana

nîveka me û wana xweş nîne. We hew dît, hatin û revo berev kirin  
û  
birin. Wî alî da neçin ha! Min gote we ha, hûn wî alî da herin, hûnê  
hew  
bibînin, ko cerda Denizê diz avîte ser revoyê û hûn jî dîl girtin û birin.  
Bila qet li rûyê we da şer û gêre çênebe. Baş agadariyê li hespan  
bikin.  
Hemû êvaran, ko hûn hespan tînin extirmexanê, wana bihejmêrin.  
A, ew  
mahîna hanê, ewa şînboz, mahîna Emer axayî bixwe ye. Navê wê  
Şemlê  
ye. Şemlê mahîna hawarî û gaziyan e. Emer axa li hawarî û gaziyan  
şevane  
da li wê siwar dibe. A, ewa hanê jî, ewa hane reşboz e bilind jî  
mahîna  
Barxane ye. Ev herdu mahînanana li ber dilê Emer axayî pir şîrîn in.  
Revo  
hemû aliyekî û ew herdu jî aliyekî ne.«  
Bi arîkariya meyteri revo gîhandin lewergehê. Revo li lewergehê da  
bi-  
jiqî û Kerr û Kuliki jî her yekê xwe dane çengekî revoyê.  
Şemlê û mahîna Barxane her dem li rex hev diçêriyan. Herdu jî li  
nava  
revoyê da dûr va dihatin xûyanê. Şemlê li ber rengê kirasê xwe yê  
taybetî,  
lê mahîna Barxane li ber girbûn û gevdetiya xwe. Mahîna Barxane  
mahîneke reşboz bû. Ew wisan bilind bû, ko çî hesp û mahînen dî li  
ser

wê nediketin. Li nava revoyê da li dûr va dihate xûyanê. Navtenga  
wê  
wekî navtenga karxezalan zirav û herdu saxiriyên wê weke cotek  
hêkên  
qazan, têr û tijî û pir û hulo bûn. Guçkên wê mûç, ustuyê wê zirav û  
dirêj,  
simên wê bilind û kodikî, sîngê wê pan û vekirî, çîpên wê dirêj û  
raçandî  
bûn. Kirasê wê wisan temîz bû, ko te dikarî tu xalên li se leşê wê  
bihe-  
jmêrî. Rewneq dikete pirça leşê wê. Te dil nedikir tu bi herdu çavan  
li  
mahîna Barxane binihêrî. Emer axa li rê û rêbwariyên dûr da  
barxana  
xwe ya taybetî li wê dikir. her li ber wê hindê bû, ko navê wê kiribûn  
mahîna barxane. Ca Kerr û Kulik jî ratib û cil û tatikên xwe her li  
mahî-  
na Barxane dikirin û ew bi xwe ra digerandin û gelek caran li destên  
xwe  
da li rex mêrg û zevî û bengeyan da diçêrandin û her şev jî jê ra  
şîvehesp  
diçînîn û ew cuda li hespên dinê li ber derê konê xwe şîv dikirin.  
Çend buhar û havîn derbas bûn. Çend caran aran û zozan kirin. Êdî  
Kerr û Kulik der û deşt bînanî kefa destên xwe nas dikirin. Herdu jî  
roj  
bi rojê mezin dibûn û bejin vedidan. Berê simbêlên herduyan jî xûyî  
dabûn. Bibûn cotek xortên tazegihîştî. Du xortên bi milên hev ra. Du

xortên bi zend û bend û bilindbala û tevkutayî. Zewêlekên destên  
wan  
badayî û bitew, navmilên wan pan û sîngên wan bilind û biber  
hêtanpê-  
162 BILÎCAN

tanî û gir û gevde bibûn.  
Hemû şevan revo dihanîn extirmexanê û hemû sibêdeyan jî revo ji  
ex-  
tirmexanê derdixistin û dibirin lewergehê. Du canî li dû mahîna  
Barxane  
bûn. Canî mahîneke biriye û canî hespekî şîr e. Ew herdu caniyana  
jî  
kişandibûn maka xwe. Du caniyên tor û çeleng. Du caniyên  
hûştûştokî  
û hişiyar.  
Li nav giştî revoyê da xoşina Kerr û Kuliki bi mahîna Barxane û herdu  
caniyên wê ra dihat. Rojên germe havînê, her roj mahîna Barxane û  
her-  
du caniyên wê li ber avên çem û kaniyan, li ber avên şorik û gol û  
gol-  
mancan dişoştin. Li danê zivistanê jî, rojên ko hewa sar dibû, ew her  
sêk  
cil dikirin. Kerr û Kuliki ew her sêk jî hîmî ser destan kiribûn. Her  
caniyek jî navek lê kiribûn. Navê canîmahînê kiribûn Sosik. Navê  
canîh-  
espi jî kiribûn Nijdî. Ev herdu caniyên ji Kerr û Kuliki pêve, çi kes û çi  
tiştên dî nedihebandin. Gava ko Kerr û Kuliki navên wan caniyên di-



hanîn, herduk di gavê da li ber wan amade dibûn. Yan jî gava ko bi  
du  
deng biftandana, ew herdu canî bi rêka fersexan jî ji wan dûr  
bana, bi  
bayê bez û birûskê ra xwe bi Kerr û Kuliki ra digîhandin.  
Sosik canîmahîneke reşboz bû. Kişandibû maka xwe. Ew û maka  
xwe  
te digot letên sêvekêne, ko li ber hev Kerr kirine. Sosik  
canîmahîneke pir  
hişyar û hûştûştokî bû. Durust weke xezaleke sil bû. Bi xiştînekê ra  
serê  
xwe bilind û guçkên xwe mûç dikir û li dor û berên xwe dinihêrî û  
bîn-  
fişk vedida û dibû fîrefîra wê û li dora revoyê ra dikete çerxê. Îca  
hînga  
Nijdî jî çav didayê û dikete dû wê û herdu li dora revoyê ra diketin  
cirî-  
danê. Nijdî canîhespekî reşî zîl bû. Wisan reş bû, te digot qay  
şebeye. Li  
ber reşatiyê kirasê wî diteyîsî. Leşê wî bînanî şebeyeke reşe zîl wisan  
saf û  
hulo bû, mirovî nikarî xwe li ser piştta wî ya şimitok bigirta.  
Kerri her dem digot:  
»Ew hespê şevereşa ye. Mirovî li şevereşan da destek cilkên reş li  
xwe  
bike û li Nijdiyî siwar bibe û here nijdê.«  
Ewana her li ber vê hindê navê wî danîbûn Nijdî. Digotin Nijdî hespê  
nijdê ye. Lê dayîka wan, Werdekê digote wan:

»Lawên min, hespên ko ji Necda Erebistanê tên, ji wan ra Necdî dibêjn.«

Lê Kerr û Kuliki nedipejirandin û digotin:

»Dadê Nijdî yanê hespê nijde û cerdê.«

Kuliki digot:

Xwazî Nijdî jî canîmahîn ba. Çunku mahîn li şevereşan da, nahîrin û

163

BILÎCAN

naşîhin. Lê eger hesip şev bêhna mahînekê bibêhnin, bînanî birûskekê

dihîrin. Li agirê mahînekê da dişewitin û durust weke ewrê derbuharê di-

hîrin. Îca bi yekimîn dengî ra dijmin bi mirovî dihesin û ya xwe bi mirovî

dikin.

Keri digot :

»Ew jî hêsan e. Zor sanahî ye. Rêka wê jî heye.«

— Rêka wê çî ye?

— Pêdiviye, mirovî hespên hîrhîrokê bike yexte.

— Te got yexte! Mala te nekeve, destên te çawa diçe Nijdiyî tu dibêjî

mirov Nijdiyî bike yexte. Hespê ko bû yexte, êdî ji şak dikeve. Hem jî

hespek eger bû yexte, êdî zêde nake. Bejin venade. Pêş da naçe û bi gevde

nabe. Dipitixe. Hema li ser bejna xwe ya pêşîn dimîne. Dikevgire û pix-

tikî dibe û şûşman nabe.

— Erê Yezdan kem tu rast dibêjî, heyfa Nijdiye, mirov Nijdiyê bike yexte.

— Tu li me binêre, lo! Tu dibêjî qay Nijdî hespê me ye, em ji xwe ra, li bal xwe navan lê dikin. Dikin yexte...

— Hey tu ji Xudê ra çî dibêjî, hema me Nijdî ji Emer axayî stand, stand.

— Erê da, ma yê xêra bavê xwe bide?!

— Erê da, ma em xulamên bavê wî ne. Eva çend merce em diçin ber revoyê wî. Ma yê xêra bavê xwe bide.

— Erê Yezdan kem tu rast dibêjî, emê li dewsa heqê xwe Nijdiyi jê bistînin.

— Te Sosik jî hema ji bîr ve kir, ha! Emê Sosik û Nijdiyi herduyan jî jê bistînin.

— Erê emê herduyan jî jê bistînin.

— Ya repetepa lingên hespan li şeverişan da jî hêsane ha, tu dizanî?

— Na, çî ye?

— Eger şev tu çûyî nijdê û cerdekê û te nexwest, ko dijmin dengê lingê

hespê te bibihê, pêdiviye, tu her çar simên hespê xwe kulav bikî.

— Çawa ?!

— Qet pir sanahiye. Bi her simekê hespê xwe va ta xirtika lingan Kerrekulavekê bi ser û ber bialîne û li dû ra pê arşûjineke mûyê bizinan

baş bidirû. Vêca li şeverişan da li peleguha dijmini ra jî derbas bibî, dengê

simê hespê te nabihêze. Eger mirov wî kulavî baş û bi ser û ber  
bidirû, ew

solikên kulavîn têra riya heft rojan dike. Dadê digot carekê kalkê  
Hesê

164 BILÎCAN

wisan çûbû, avîtibû ser rêbiran û rêbir di şarga wan da dîl girtibû, û  
hanîbû dîwanxana mîrê ereban. Digot, ta ko kalkê Hesê li ser wan  
da

girtibû, paşê bi xwe hesiyabûn.

Kerr û Kuliki li her derî diaxiftin û her cure bîr û hizir dikete serê  
wan.

165

BILÎCAN

22

Her şev gava ko Kerr û Kulik li ber revoyê dizivirîn, Werdek weke  
cûn-

cikekê li dora wan ra dihat û diçû. Çarix û goreyên wan diguhest.

Xwerekê wan bi ser û ber bi wan dida xwarinê û li dû xwerekê ra ji  
çawaniya hespan û lewergêh û rewşa Sosik û Nijdî û mahîna  
Barxane pir-

siyar fikir û ji wan dixwest, ko bi roj li çolê çî dîtine û çî bihîstine ji  
dayî-

ka xwe ra jî bêjin. Piştî gotin û axiftinê gereda hewîsanê dihat. Her  
şev de-

mek xurt piştî şîvan, berî razanê, Werdekê her di hundurê konî da  
herdu

pehlewaniyê xwe berdida guleşê. Li dû guleşê ra fend û fêlên cur be  
cure

zoranê ji wan ra şirove dikir.

Şevêkî piştî şîvan, Werdekê gazî herdu kurên xwe kir û gote wan:

»Kurên min hûn êdî mezin bûne. Eva midehekî dûr û dirêje jî, we  
hewîsana pehlewntiyê di çek û rextan da nekirine. Ez ditirsim, ko  
hûn

çawaniya bikarbirina çekan ji bîr bikin. Lawo em xudan neyar û  
dijmin

in. Divê we şev û roj hay ji xwe hebe. Eva demeke dûr û dirêje, ko  
çek û

rextên min û babê we waye hema wisan li perê stêri da ma ye. Were  
ezê

îşev wan çek û rextana li nîveka we da pişk bavêjim. Kanê çek û  
rextên

min ji kê ra dikeve û yê babê we ji kê ra. Êdî vir ha şûn da destevala  
neçin

ber revoyê. Her dem çek û rextên xwe bi xwe ra bibin.«

Îca Werdekê bi vê gotina xwe ra banzda, çû li perê stêri du dest çek  
û

rext deranî. Ewê çek û rext bi ser û ber li nava cil û cihazên hêştiran  
da

pêçabû û danîbû perê stêri. Du sîngî, du zergên xezebê, du şûr, du  
ke-

wan, du tîrdankên tijî tîr, du xencer, du mertal, du nêze, du cot  
zendane,

du zirêx, du kulavqot li nava cil û cihazan deranî. Jêk cuda kir û kire  
du

deste û got:

»Evana çek û rextên bavê we ne, ewanê hanê jî çek û rextên min in.

Ez

êdî pîr bûme. Êdî çek û rext bi karê min nayê. Ji min ra li vêderê çek û

rext dest nade. Kes li vira nizanê, ko ez pehlewan îm. Bila qet kes nezanibe jî.«

Werdekê li dû van gotinên xwe ra gote cotên kurên xwe:

»Yek ji we pişta xwe bide min û bixeyîde, ta ko em van çekana pişk

166 BILÎCAN

bavêjin.«

Kerr pişta xwe da wan û got:

»Hanê ez xeyîdîm.«

Werdekê qelema xwe li berîka xwe deranî û navê Kerrî li ser kaxetekê û

yê Kuliki jî li ser kaxeteke dî nivîsî û li ser hev da qet kir û gote Kerrî:

»Ker were van herdu kaxetana, her yekê bavêje ser pişkekê!«

Kerr li ser wan da zivirî û kaxet li nav destê dayîka xwe hilanî û her yek

avîte ser pişkekê. Werdek xwar bû, kaxeta li ser çek û rextên Silêmanî hil-

da û jêk vekir û xwend:

»Kerr.«

Îca destên xwe lev da û da çepikan û got:

»Pîroz be! Çekên bavê we ji Kerrî ra ket û çekên min jî ji Kuliki ra. Li we herduyan jî pîroz û bimbarek be! Her bijîn kurên baş! Li vê gavê şûn

da îca hûn êdî mêr û pehlewana înan. Haya we herduyan jî bi hev hebe.  
Her

roj gava ko hûn hespan tînin mozirganiyê, çek û rihtên xwe girê  
bidin û

li çolê demekê hewîsanê bikin. Bila fend û fêlên çekdariyê ji bîra we  
neçe.

Lê li ber çavên xelkê çekên xwe li xwe nekin. Xelk çavnebar in.«

Kerr û Kuliki destê dayika xwe ramûsîn û li dû ra çek û rextên xwe  
girê-

dan. Ê wekî du pehlewanan li ber hev ra hatin û çûn. Werdekê gote  
wan:

»Zor pîroz be! Îca hûn westiyan e. Çekên xwe bişiqitînin û razên!

Derenge, hûnê sibê zû biçin ber revoyê. Hemîn hûnê li çolê  
hewîsanên

xwe bikin.«

Kerr û Kuliki çek û rextên xwe şiqitandin û xirpişînan nav nivînan. Lê li  
ber şabûna çek û rextan ta sibêdê xew li çavên yekê ji wan jî neket.

Sibêdê

gelekî zûtir ji demên her roj ji nav nivînan derketin û çûn mahîna  
Barxane înan û çek û rextên xwe, ko li nava tatik û cil û cihuran da  
pêçabûn, dane ser piştê wê û revo berdan û ber bi pawan hespan  
rê ketin.

Êdî ji wê rojê şûn da Kerr û Kuliki çek û rextên xwe bi xwe ra dibirin  
çolê û li ser bisparteya dayîka xwe heftiyê sê, çar caran, gava ko  
hesp di-

dane mozirganiyê, xwe li çek û rextan da tev girêdidan û xerîkî  
hewîsanê

dibûn. Milmilanê, nêzebazî, kewandarî, nîşanbazî, şûrweşînî, xenceranê,

zerganê û her cur û celebên hunura şervaniyê da hewîsan dikirin. Li zo-

ranê û rimbaziyê da Kerrî bi Kuliki nedikarî. Kulik ew ditewand. Lê li şûrweşînî û nîşanbaziye da Kuliki nedikarî dest û lepan li ber Kerrî hilîne.

Ewan ji bilî hewîsana çekdariyê hewîsana siwariyê jî dikirin. Rojê danekî

xwe li çek û rextan da dipêçan û li Sosik û Nijdiyî siwar dibûn û li dora

revoyê ra diketin çerx û cirîdanê. Ewan herdukan jî bixwe Sosik û Nijdî

167

BILÎCAN

hîm kiribûn. Sosik qedem û Nijdî jî orxe hîn kiribûn. Sosik li ber para Kerrî û Nijdî jî li ber para Kuliki ketibû. Suwariya Nijdî pir xweş bû.

Nijdî siwarê xwe li ser pişta xwe nedileqand. Lê bi çifta Sosikê ra nedige-

hîşt. Rast bû ko Sosik orxe nibû, lê di çiftê da Nijdî bi toza wê ra jî nedigihîşt. Ca gava ko Kerr û Kulik derdiketin hewîsana siwariyê, hespên

xwe fêrî her cure tewil û bazan dikirin. ewan li ser kevir û kendalan ra di-

dane banzdanê. Li serhevrazan da li yek bînê da ew radiqetandin û li ser-



berjêrên pir nişîv da bi xar û mêl dajotin. Li rastiyan da gava ko herdu hesp bi guj dajotin, xwe bi tengên wan va digirtin û li ser piştta wan ra dadiketin binzikên wana û çendîn seriyên wisan hema li binzikên hespan da xwe li ber çavên dijminên gumaneyî vedişartin. Li vê hewîsanê da Kulik ji Kerrî jêhatîtir bû. Kerr giran bû. Nikarî baş xwe bi tenga Sosikê va bigre û Sosikê li wê rewşê da bibezîne, lê Kulik çendîn seriyên ji Kerrî zêdetir ew hewîsana didomand. Kerrî berhane ji Kuliki digirt û digotê, Nijdî orxe ye, lew ra tu dikarî baş li binzikê wî da xwe ragirî. Lê Sosik hem qedeme, hem jî gavrapîv e. Siwarê xwe li binzika xwe da dihejîne û diçelqîne. Kuliki digotê de were li ser piştta Nijdiyî xwe biceribîne. Lê Kerrî nedipejirand. Rojê buharê ya meha cotanê bû. Danê nîvro bû. Tavê zeliqandibûyê. Kerr û Kuliki revo ber bi mozirganiyê top kirin û dîsan fenanî caran xwe li çek û rextan da pêçan û xwe tevgirêdan. Taze dixwestin dest bi hewîsanê bikin, ko nişkêva Kuliki dît, revdeyek siwar li wan hingavt. Berê we hizirî, ko rêvîngin, lê li dû ra dîna xwe dayê neherê, evan waye

bûne du desteyan û herdu deste jî waye durust ber bi wan dajon.

Kuliki

li Kerrî kire gazî:

»Kuro cerdê em girtin!«

Kerr pê keniya û gotê:

»Çiye ziravê te qetiya!? Cerda çî! Mêrkan waye li riya xwe da diçin.

Tu

nahêlî xelk li riya xwe da jî here?!«

— Kuro Kero rêya çî! Rêvîngê çî! Mala te nekeve ca çavên xwe veke

û

dîna xwe bidê, evana waye hemû çekdarin û waye rast ber bi me dajon.«

Bi vê gotina Kuliki ra, Kerr li siwaran hûr bû û got:

»Yezdan kem tu rast dibêjî, kuro li ser hemdê xwe be ha. Emê ji mirinê

ra lêdin û ta dilopek xûn jî li bedena me da mabe, emê li ber xwe bidin.«

Bi vê gotinê ra her yek ber bi hespê xwe bezîn.

Ta ewan li hespên xwe siwar bûn û xwe dane çengê revoyê, Siwaran xwe bi wan ra gîhandin.

168 BILÎCAN

Kerrî li siwaran heyband:

»Lolo hûn kî ne?«

— Kir be, kurê dêlê, dena ezê cergên te bînime derê.

— Kurê dêlê jî, kurê sê jî. Li nav hespan derkevin!

Lê siwaran bêpakî dakutane nav revoyê û revo kirin du tîşan û tîşek ber

bi binê geliyê hajotin û tîşek jî ji Kerr û Kuliki ra hêlan.

Vê carê Kuliki li cerdê heyland:

»Kuro lawo li nav revoyê derkevin û nebin bikujên serê xwe.«

Siwarekî cerdê got:

»Kuro tu li min û vî boncî yî! Dibêjî qay serê te giraniyê li leşê te dike.«

Ca bi gotina xwe ra rikêfî ser Kiliki kir:

»Kuro em dibêjin hûn rênçber in. kurên xelkêne. Gunehê me li we tê.

Eva çend salin hûn bi ferman Emerokî kewşenê me diçêrînin, qey hûn

nabêjin evî kewşenî xudan heye? Kir be, dena emê we jî tevî revoyê bikin.«

Kuliki gotê:

»Boncî tu bixwey î, lawo, bixwe paşê bişêkirîne. Li nav revoyê derkevin!

Bi Yezdan ta hûn li ser leşê me ra derbas nebin, em nahêlin hûn mûyekî

ji revoyê kêmbikin.«

— Lawo zirtan neke! Em dibêjin hûn law in, ber bi mirazin. Em naxwazin mirazên we li çavên we da bihêlin. Hûn çima xwe li ber revoyê

Emerok i da didine kuştinê?

— Her çî ji destên we tê, xwe jê nehêvişînin!

Bi vê gotina Kerrî ra siwarekî hirçanpirçanî, wekî kirtanekî tevkutayî, sungiyeke çargezî li destî da, fîrefîra hespê wî bû, kef li ser devî ketibû û li

bin suwarê xwe da neditebitî, dizgîna hespê xwe li ser Kerrî da zivirand û

ferman da suwarên dî:

»Gedeno dest û piyên herduyan jî girêdin û bavêjin terkiya hespan. Evan ne mirovên qencyê ne, ko mirov qencyê bi wan bike. »

Çar pênc Siwaran bi hev ra hêriş birin ser Kerr û Kuliki.

Ker û Kuliki bi hev ra dest avîtin darê sîngiyan û rikêfî ser wan siwaran

kirin. Bû şîrqîna sîngiyan û fîrefîra kehlân û mehnegiyan. her li yekimîn

hêrişê da sê siwar li xanên zînan ketin erdê û du suwarên dî jî li ber xwe

dan, lê berxwedana wan jî hind nekişand. Li hêrişa dûyê da, ew herdu jî

ji xanên zînan da jor da ketin û sê hesp û du hesp li revoyê zêde bûn.

Kerr

û Kulik li dora revoyê ra çerixandin û navbirî dane cerdê û revo topî ser

hev kirin. Serokê cerdê ewê hirçanpirçanî ferman da cerdê:

169

BILÎCAN

»Kuro bi hev ra rikêfî ser wan herdu zolemiraran bikin!«

Bi fermana serekcerdî ra siwar li dora Kerr û Kuliki werhatin. Li ser serê

lawên Werdekê bû şîrqîna şûran û şîngîna nêzan û teqêna darên sîngiyan. Lawên Werdekê bînanî du pehlewanên bi ezmûn, mertalên

xwe dane ber xwe. Bi bergirî ji xwe şer domandin. Şer giran bû.  
Bêhna  
xûnê dabû serên lawên Werdekê. Du gencên zîx û zorbe bînanî du  
pil-  
ingên çiya û du gurgên dev bi xûn ketin nav suwarên cerdê. Bi hev  
ra nêze  
jorda dihanîn. Carê qîjîn bi suwarekî diket û li erdê wedileziya. Şivan  
û  
gavan û berxewanan hawarî li zoma Emer axayî daxistin, ko cerdê  
avîtiye  
ser revoyê.  
Di germegerma şeri da, serekcerdî bi kel û bîn xwe bi Kerrî ra gîhand  
û  
sûngiya çargezî dirêjî Kerrî kir. Kerrî mertalê polayîn da ber sûngiya  
wî.  
Gijêna mertalê Kerrî der û deşt hejikand. Zingîn kete geliyî. Vê carê  
Kerrî derfend ji suwarê hirçanpirçanî istand û serê sûngiyê ber bi  
depa  
sîngê wî dirêj kir. Suwari xwe li ber sûngiyê revand, lê serê sûngiyê  
li gir-  
ka milê wî da çik bû û girka milê wî qelaşt. Bû fîşqîna xûnê li milê wî  
ra  
hilavît û vê carê Kerrî sûngiyeke dî jî dirêj kirê. Suwari zengî li hespê  
xwe  
da û bi bez xwe li hêrişa sûngiyê dûr xist. Sûngiyê vê carê zikê hespê  
wî  
qelaşt û hûr û pizûrên hespi rijiyane nava dest û piyên wî û bi dar û  
de-

venan va aliyan. Her li gavê da bû şîhîna hespî û li bin siwarê xwe  
da li  
erdê velezî ya. Li wê demê da pêşiya hawariya zomê li girê pêşberî  
pawana  
hespan ra li wan derket. siwar û peyayên êla Emer axayî bînanî  
kuliyên  
payîzê li ser cerdê da barîn. Gava ko cerdê ew dîmena dît. Pirtê pirtê  
kete  
nav wan û her yek li aliyekî da helatin û way li wî ko giyanê xwe  
rizgar  
nekirî û nehelatî. Her kes kete hizra giyanê xwe da. Kerr û Kulik tev  
ber  
bi suwarê gorînî kudandin. Lê ta ko Kerr û Kuliki xwe bi suwari ra  
gîhandin, siwar ji erdê rabû. Sûngiya wî li desti ketibû. Ta dest avîte  
şûrê  
xwe, ko ji kalani derîne, Kerrî nêza xwe da binçena wî û gotê:  
»Nelive! Tu hema bilivî, ezê te hincîhinciyî bikim.«  
Kuliki xwe pê ra gîhand û destên wî li piştê da bi arşûjineke mûyîn  
bitew girêda.  
Hawarî pê ra giheştibû. Emer axa bixwe jî li nav hawariyê da bû.  
Paşiya  
hawariyê hê jî dikişiya. siwar û peya bûn, ko dihatin. Revo berev  
kirin.  
Emer axa hat û li ser terman ra rawesta. Pênc term li ser hevdu da  
nix-  
ilîbûn. Gola xûnê li ber wan meyîbû. Çavên wan vekirî mabûn û zil  
li

mirovan dinihêrîn. Poşmanî ji çavên wan dibarî. Te digot qay ji mirovan

ra xeber didin û dibêjin: Li me bibihorin. Me nizanî. Me şaşiyek mezin

## 170 BİLÎCAN

kir. Me nezanî kir. Em bêguneh bûn. Em bi destûra serekcerdî hatine...

Lê êdî çi tişt para nemabû. Çi tişt ji dest çi kesî nedihat. Giyanê ji kalani

derketî, çi kes neşê bizivirîne. Emer axa berbirî Kerr û Kuliki hat. Kerr û

Kuliki xwe li cil û bergên pehlewantiyê da pêçabûn. Emer axayî pêş da

ewan nenasî. Paşê ko baş bera xwe dayê, dît ko ewan Kerr û Kulik in.

Kerr û Kuliki destên serekcerdî li piştê girêdabûn û ew dîl kiribûn û dabûne pêşiya xwe, jor da dihanîn. Emer axa gihîşte wan. Xûn li ser dîli

ketibû. Nalenal û îş û ofa wî bû. Emer axayî serekcerde her di gavê da

nasî. Ew kurê Deniz Begî bû. Hatibû ko lekeyekê li wan xîne. Lê pênc kuştî danîbû ser û bixwe jî dîl hatibû girtinê. Hatibû heyfa bavo, lê dadê

jî li ser da derdabû. Gava ko Emer axa rastî wê bûyerê hat, ji hespê xwe

peya bû. Eniya Kerr û Kuliki ramûsî û gazî siwarekî kir û got:

»Kuro zûka evî birîndarî bigehînin êlê. Bêjin bila zû Baylozi bînin û ewî derman bikin. Bêjin Baylozî bila wî ya baş derman ke, ha!«

Bi gotina Emer axayî ra suwarek ji nav Siwaran derket û hate bal birîn- darî. Du, sê kesan alî hev kirin û birîndarê dîl li terkiya wî suwarî kirin û ew bi siwarî va baş girêdan û şandin nav êlê. Birîndarî xwe diçirçirand.

Du, sê caran li ser pişta hespi, hindik mabû, siwar jor da bixista, lê suwar, sauwarekî kirarî bû. Gîr nedidayê û hey ew şîret dikir û hey jî gef lê dixwar.

Suwar û peyayên hawariyê revo berev kirin û li ser êlê da hajotin. Emer axayî ferman da û got:

»Bêjin bila şivan û berxevan û gavan giştî pez û dewaran bajon, herin kewşenê pêş malan, da ko dijmin tên termên xwe dikişînin.«

Şivan û berxevan û gavan û revîvan û kelevanan hemûyan pêkve Kerrî û garan û revo top kirin û dane pêşiya xwe û ber bi kewşenê pêş malan hajotin. Kalekal û barebar û oreor û deng û gazî tevî hev bibûn. Birîndar gîhandin nav malan. Werdek li ber derê konî rawestabû. Êh li ber çavên wê ra nedihat. Dayîkên rênçberên dî digotin û digiriyan û her



kê dihat, nas û nenas pirsiyara zarên xwe ji wan dikirin. Lê Werdekê  
te  
digot qay çi kesê wê li çolê û li meydana şeri da nîne, xwe dabû ber  
derê  
konê xwe û li komelê û hat û çû û deng û hawariyê dinihêrî. Ew  
suwarê  
ko birîndarê dîlkirî hanî, bi dengekî bilind gazî jin û zarên ko  
digiriyên û  
bêtabî dikirin, kir û got:  
»Na, na hûn çi digirî! Hûn qirik bin li ser jinaniya xwe da. Hûn jî  
dibêjin em dayîkin û me ji komela xwe ra kur mezin kirine, mêr per-  
werandine, Werdek jî dibêje min kur mezin kirine û mêr  
perwerandine.

171

BILÎCAN

Lawên Werdekê lêdane pênc diz kuştine û ev jî serekê cerdê ye, ko  
birîn-  
dar kirine û dîl girtine. Bixwe jî sipas ji Xwedê ra qet difina wan jî  
xûn  
nebû ye. Suwari di gel vê gotina xwe dîl gîhande ber derê mala Emer  
ax-  
ayî û ew li pişt xwe vekir û peya kir û gazî berdestkekî kir û gotê  
were zû  
li hespê min siwar be û here pey Baylozî. Bêjê Emer axayî gotiye,  
bila bi  
bayê bezê were. Rewşa birîndari baş nîne. Berdestik li hespê wî  
siwar bû

û hesp da ber zengiyar û bi xaran ber bi mala Baylozî çû.  
 Perîşan jî bi koma qîz û bûk û keniz û kulfetan va li ber derê xîveta  
 xwe  
 rawestayê û guçkên wê li ser hawariyê ye. Perîşan neditebitî. Diçû  
 xîveta  
 xwe û derdiket û dihate bal qîz û bûkan. Bi bihîstina navê Kerrî ra,  
 he-  
 man ew pirûska ko du, sê salan berî niha li ber derê konî dilê wê ler-  
 izandibû, dilê wê dîsan weke hêlikanekê hejikand. Dilê wê bi tundî  
 lêdi-  
 da. Bêhna wê diçikiya. Nedihecimî. Ketibû ta û têtê. Gotegot ketibû  
 na-  
 va xelkê êlê û ev gotinan ji devên hev direvandin:  
 — Kerr û Kulikê Silêmanî pehlewan in.  
 — Mêrxas in.  
 — Kiçê pênc mêr kuştine û serekê cerdê jî birîndar û dîl kirine.  
 — Hema bi destên vala?  
 — Na ha, herduk jî li çek û rextên pehlewantiyê da bûne.  
 — Mêrikan mala wan her li berê da mêr in.  
 — Bera mêran, mêr jê radibin.  
 — Kiçê herdûk jî li cil û bergên asinîn da bûne.  
 — Kiçê bi şûr û mertal û sîngî û zirêx in!  
 — Kiçê Xudê herdu jî pehlewan in.  
 — Erê, erê Yezdan kem, herdu jî pehlewan in.  
 — Kiçê herdu jî pehlewan in, lê yê mezin çavê Xudê lê be, ji xwe ra  
 pirtîkek agir e. Bizot e, bizot.  
 — Na Xudê herdu jî li ser hevdu ra nin.  
 — Yek ji yekî zêdetir nîne.

— Herdu jî ji xwe zêde ne.

— Na, na, birayê mezin destê Yezdanî li ser serî be, her pirtîka agirê birûskê ye.

— Kiçê Xudê birûsk li ber çavên wî difire.

Hindekan qet Kerr û Kulik nas jî nedikirin û qet nedîtibûn jî, lê li ber wê hindê ko ji xelkê paş da nemînin, ewan jî dest pê dikirin û pesnên wan

herdu pehlewanan didan.

Guçkê Perîşanê li van gotin û pesnan bû. Evan gotin û pesnana dilê wê

## 172 BİLÎCAN

dilerizandin. Ew pirûska caranî dîsan dihat û li nav çavên wê digeriya û

dilê wê ser û binê hev fikir. Ew keyfxoş bû. Digot û dikeniya. Li ber şabû-

na hinarkên rûmetê wê sor û geş bibûn. Kerrê delal talanê bavê wê zivi-

randibû. dijminê bavê wê dîl girtibû, birîndar kiribû. Neditebitî. Diçû xîveta xwe û tişteke digot û dîsan bi ken û gulşayî dizivirî nav hevalan.

Li

ber xwe da li nava dev û lêvan da tişteke digot. Lêvên wê yên sore gêlasî

diricifîn. Tişteke bînanî lawijeyan li ber xwe da digot. Bi tilîlî çû aliyê heremserayê. Çû kete xîveta xwe. Erê lawije bû, ko digot. Bi dengê germ û nerm û dilhebîn, hêdîka lîlandê. Gava ko giheşte xîveta xwe, kûşkê dengê xwe bilind kir û got:

Cerd derketî, cerda roye. Cerd derketî cerda ro ye.

Avîtiye ser revoyê hespên di bavo ye.  
Hawarîkê hatiye bi şayî û xweşî, bi lolo ye.  
De dibêjin yê ko mêran dikuje, terş û talanan dizivîrîne, lawê  
Werdekê,  
kurê Silêmanî, mêrxasê mêran, na Xudê berdilka dilê min evdalê  
navê wî  
Kerro ye.  
Hay ji serê xwe nemabû. Agirê evînê pêtî dida. Leşê wê germ bibû.  
Bêhna xwe taze kir û dîsan lîlandê:  
De berdê, berdê, berdê, lawiko berdê.  
Berdilka dilê min evdalê berdê.  
De mêrxaso berdê, çapûku berdê.  
Palewano berdê, xoşewîsto berdê, dilrevîno berdê.  
Tu yê ji dilê min evdalê kuta bike, êş û kul û evê derdê.  
De tu yê seriyên jê bike leşan bavêje erdê  
De dibêjin yê ko pênc mêran dikuje, dîl dike serekê cerdê.  
Ew berdilka dilê min evdala Xudê Kerrê delal lawê Werdê...  
De lawiko berdê, berdê, berdê, berdê, berdê, berdê,...  
Li pişt serê xwe ra mêze kir, dîna xwe dayê, berdestka wê Macana  
Cano  
li pişt wê rawesta ye. Çavên wan li nav çavên hevdu ket, Perîşanê  
serê xwe  
kire ber xwe. Macanê gotê:  
Xoşdeviya min çi zû dilê te ketê!  
— Macanê taze nîne ku!  
— Lê kengê ve raye!?  
— Tê bîra te, hê wê salê dema ko di gel Mamê Îsi hatibûn  
dîwanxanê

ha, gava ko em li ber derê konî rastî wan hatin ha, hê hînga va ewî dilê

173

BILÎCAN

min revandiyê. Şûşa dilê min bi avirên birûskasa derizandiyê. Qirikê hema gava ko çavên min li nav çavên wî ket, serê bavo pirûsk ji çavên wî

barîn. Bi Yezdan kem agir ji ber çavên wî firîn. Min hema rastî jî du mû

yên giyanistînî li nav çavên wî da dîtin. Serê bavo her cara ko ez navê wî

tînim, yan dema ko ew roja tê bîra min, ew pirûska çavên wî tê li nav

çavên min da dirûnê û dilê min dilerizîne.

Perîşanê li ser hev û bi kel û bîn diaxift. Vêca bi gotinên xwe ra destên

xwe li skura Macana Cano ra bir û ew têr maç kir û gotê:

— Macanê ji kesî ra nebêje ha!

— Na, na dilniya be! Ez ji çi kesî ra nabêjim. Lê te çima ta niha ji min ra nedigot?

— Xudê rûyê min nedigirt.

— Na, na te ji min ra bigota, ha.

— Macanê bila hê çi kes ji min û te pêve, pê nezanibe, ha! Kanê dûmaya karên me tê li ko asê dibe. Bila li ber guçkên bavo nekeve ha, bavo

bibihê, yê porên min kur bike.

— Na, na ji solika xwe ra bêje. Xudê te ta niha ji min ra bigota, niha

min mêjve destên we kiribûn nav destên hevdu da.

— Macanê dîsan jî dereng nîne.

— Hay hay, li ser ser û herdu çavên xûşka te.

174 BILÎCAN

23

Bayloz kalemêrekî bejinbilindî, navziravî, li hindav da hilkişayî bû.

Temenê wî li ser nud û neh salan ra bû. Ew hind baş li ser xwe mabû,  
ga-

va ko pişta wî biketa mirovi, mirovî we hizir fikir, ko ew xortekî  
çarde-

salî ye. Lê gava ko berê wî dikete mirovi, çavên mirovî bi simbêlê wî  
yê

kever û cotên birû yên sipîçîl diket, mirovî dizanî, a, ew mêrekî li nav  
salan da çûyiye. Baylozi simbêlekî qeytanî dadinî. Simbêl û birûyên  
wî te

digot her yek lûfikek pembo ye, ko te bi dest bi ser çavên wî va  
zeliqandî

ye. Birûyên wî li ser çavan da qet bibûn û ji çavên wî ra bibûne  
sîvank. Li

dar û nedarên cîhanê da, tenê hespekî bayloz û têrxorceke wî û  
odeyek wî

tijî gul û gîha û pincarên dermanî hebû.

Gava ko dibû buhar, Bayloz li hespê xwe siwar dibû û serê xwe  
hildida

û dikete çil û çîyan. Ew tim li zang û tatistan û beroj û kaş û beyaran  
di-

geriya. Ewî bi hezaran gul û giyayên berojan, bi nav û nîşan dinasî.  
Li her  
gîha û gulê nimûneyek li têrxurca Baylozî da hebû. Ca ewî bi wan  
gul û  
gîhana dermanên cur be cur çêdikir. Baylozî ne tenê ji derdên  
mirovan ra  
derman çêdikir, belkû ewî derdên ajelan, bi taybetî derdên hespan  
jî baş  
nas dikir. Her kêderê nexweşek heba, birîndarek heba, hespekê  
nexweşiyek bigirta, dişandin peyê Baylozî. Bayloz bêy wê hindê ko  
xwe  
gîro bike, bi lez û bez li hawara nexweş, yan birîndaran da diçû.  
Bayloz mirovekî gerîde û cîhandîtî bû. Ewî giştî êl û eşîretên  
Kurdistanê bi nav û cî nas dikir. Xelkê welatî jî hemûyê ji hûr û giran  
Baylozê nojdar bi nav û deng û reng nas dikirin. Lê di gel wê hindê  
jî kesê  
nedizanî, ka Bayloz xelkê kêderê bûye û ji kêderê hatiye. Rast bû ko  
ew li  
navça jêrdesthelatdariya Emer Axayî da dima, lê kesî nizanî, ew li  
ko  
hatiye û pêşda xelkê kêderê bûye. Herwisan kesî nizanî ka Baylozi  
navê  
van hemû gul û gîha û pincarana ji kê û li kêderê hîn bûye.  
Gelek caran li rêkên pir dûr ra dihatin dû wî û ew di gel xwe dibirin  
sera  
nexoşan. Baylozî li himber vê xizmeta giring da destmizda xwe çî tişt  
nedistand. Ca evê hindê jî lap rêz û sengiya wî li nav gelî da biribû  
serê.

Li giştî berevî û dîwanxanan da Bayloz tim li serê jorê, li rex axa û  
beg û

175

BILÎCAN

mîran rûdinişt. Gava ko derî li komelekê vekira, giştî komelê bi cahil  
û

ahilan va li ber piyên wî radibûn. Dema ko navê Baylozî bihata,  
komelê

bi giraniyeke taybetî, bi pîrozî navê wî dihanîn. Baylozî ciyê xwe li  
nava

tewawî dilan da vekiribû. Heylo dilreş û çavnebaran jî rêz ji wî ra  
digirtin.

Mala Baylozî bibû nexweşxana giştî û dermangeha tebayî. Odeyeke  
wî ya

taybetî hebû, gava ko derê odê vedikir, bêhna gul û gîhayên beyanî  
mirov

mest û gêj dikir. Tûrik tûrik gul û gîhayên cur be cur bi dîwarê wê  
odê va

darda kiribû, û navê her yekê û çawaniya bikarbirina wan û cîhê ko  
ew

gul yan gîha û pincarana lê hêşîn dibû, li ser nivîsîbû. Gîhagewrik,  
gîhamamedik. Gîhabend, tolik, pelgeno, rezkêûvî, ronas, heliz,  
guh-

bizink, guhançêlek, qanok, çavêga, tîjtîjok, mijmijok, gezgezok,  
qaşim,

so, û bi sedan gîhayên cur be cure dî.



Bayloz wekî her car li odeya xwe ya taybetî da bû, ko suwarekî bi bayê

bezê xwe li der mala wî ra gîhand. Bi dengê simên hespi ra Baylozî mêmê-

vanê xwe nasî û zanî dîsan weke her car, birîndarekî birînkûr hewceyî

arîkariya wî ye. Hê siwar li hespê peya nebibû, ko Baylozi postalên xwe

kişande piyên xwe û ji mal derket û pirsî:

»Xêre?«

— A, a, xê e. Ciyê nihêraniyê tune ye. Cerdê avîtiye ser revoyê mala Axayî. Revîvanan lêdane serekcerd birîndar kirine. Axayî ez şandime...«

Bayloz nehîşt ew gotinên xwe kuta bike. Bixwe banz da tewlexanê û

hespê xwe ko xurcika dermanan li terkiyê va girêdayî bû, kişande derva û

lê siwar bû û di gel wî siwarî bi xaran ber bi mala Emer Axayî kudand û

li meydana kê da xwe gîhande mala Emer Axayî.

Li dîwanxana mala Emer Axayî da hêvirze û deng û hera bû. siwar û peya hemû ji hawariyê zivirîbûn û li hundurê dîwanxanê da li ser mêranî

û mêrxasiya Kerr û Kulikê Silêmanî diaxiftin.

— Kuro Yezdan kem mêmê li ser Kerrî ra nehatiye. Min bixwe bi çavên xwe dît, ko ewî çawa şûrek li tera stuyê suwarê pêşîn da êda û ew li ser

xana zînî da jor da anî.

- Bi Xudê min jî dît, ko çawa şûr diweşand.
- Na, na kuro şûr nibû, sûngî bû, sûngî.
- Kuro evan ew çek û rextana li kêderê înane?
- Axayî ji wan ra daye girêdanê.
- Na, na çek û rextên bavê wan ne.
- Bi serê heft kuran mirov digot qay her yek ejdehayeke.
- Hero ewan zirêxên pehlewanan li xwe kiribûn.

## 176 BILÎCAN

- A,a, mêrikan pehlewana îna.
- Be, ev karê pehlewana. Du genc li hember sî, çil suwarên tev girêdayî da li ber xwe bidin. Pênc mêran bikujin. Pênc hespan li revoyê zêde bikin. Serekcerdî jî birîndar bikin û dîl bigirin û difina wan jî xwîn nebe.
- Erê Xudê kem herdu jî pehlewana îna.
- Li nava vê hêvirze û denge dengê da, Baylozi derî li wan vekir. Bi têtû-  
na Baylozî ra, komel tev da li ber Baylozi va rabûn. Êdî deng û hera vetexirî. Li dû ra dengê nalenala birîndarî li ser hemû dangan ket. Bayloz hat û li ber serê birîndari rûnişt. Destê xwe da ser eniya wî. Birîndar li xwînê û xûyê da mewicîbû. Li ber Kerrban reş hilgeriyabû. Baylozî fer-  
man da cilkên wî jê şiqitandin. Kincên wî li xwînê da mabû. Xwîn bi

kincên vî va meyîbû û kincên wî bi leşê wî va zeliqîbûn. Birîneke kûr  
li

ser girkê milê wî yê rastê devê xwe jev vekiribû. Hemmanê xwîneke  
reş lê

dikişiya. Baylozî ferman da:

»Ji min ra du tasik û hindek nivîşkê palaftî û hindek cabê nû bînin!  
Taseke rûn jî biqijilînin!«

Îca li dû gotina xwe ra destên xwe avîte xurcika xwe û du, sê kîsik  
giyayên hişikkirî deranî. Du, sê cure giya li kîsikan deranî û bi destên  
xwe

ewan li nava hev da pişaft. Xişexîşa giyayan bû, li nav tiliyên Baylozî  
yên

pîr û dirêj ra vî alî wî alî dişûlikîn. Baylozî ewan baş û bi ser û ber  
pixirand

û pişaft. Jê ra nivîşk, du tasik û hindek cabê nû jî anîbûn. Ewî ew  
giya-

hana li hev da û ber da nav tasikê. Li dû ra pêkutekî birûş li xurcika  
xwe

deranî û hindek nivîşk berda ser wî giyahê pişaftî û bi ser û ber ew  
giyaha

kuta û miz da. Wisan kuta û miz da, ko merhemeke baş lê durust  
bû. Li

dû ra Baylozî ferman da û gote birîndari:

»Lawê min, xwe li ser piştê dirêj ke!«

Birîndarî xwe li ser piştê dirêj kir. Baylozî dev û dorên birîna wî pê  
nivîşki şûşt û paqij kir. Li dû ra Baylozî berê xwe li ser komelê da, ko  
hemûyê xwe kir kiribûn û çarçavî mabûn û li destên Baylozî mêze  
dikirin, kir û got:

»Du kes ji we destên birîndari ra bigirin. Yek jî li ser sîngê wî rûnê,  
du

kes jî bila baş bi piyên wî ra bigirin.«

Pênc mîrên bi dest û pê li nav komelê rabûn û hatin rex birîndarî.

Dûyan destên wî ra girtin. Yek li ser sîngê wî rûnişt. Dûyan jî bitew  
bi

herdu lingên wî ra girtin. Li wê demê da rûnê daxkirî, ko qijeqija wî  
bû,

anîn û li ber destên Baylozî da danîn erdê. Baylozî berdestikek da  
ber

destên xwe û gote birîndarî:

177

BILÎCAN

»Tu amadeyî lawê min?«

Birîndarî bi nalenal got:

»A, apo ez amademe.«

Her di wê demê da Baylozî got:

»Yek, du, sê!«

Bi hejmara sêyê ra Baylozî devê tasika rûnê qijilandî li ser devê  
birîna li

ser girkê milê birîndari da kir û gulpek rûnê qijilandî durust li ser  
devê

birînê da kir. Qajîn bi birîndarî ket. Bû qijêna rûnê qijilandî û li ser  
devê

birînê geriya. Qajeqaja birîndari bû. Dengê wî bi rêka fersexan rê  
pîva. Bi

dengê wî ra zome tev hejikî û ber bi dengî hatin. Birîndarî xwe li bin pênc kesan da hildavît. Lê nikarî li bin wan da rabûya. Ewî gelekî xwe çirçirand, lê li dû ra ji tik û pik ket. Rûnê qijilandî sergirka milê birîndarî kire patîlokeke sor. Baylozî piştî kewandina birînê hindêk nivîşk danî ser de- vê birînê û li dû ra ew merhema ko çêkiribû, bi hemet û hêdîka li birînê sût. Paşê Baylozî birîn bi cabê nû baş û ser û ber pêça. Cab li ser girkê milê wî ra bir û li binçenga wî ra derbas kir û li ser sîngê wî herdu serên parçe bi hev ve îşkeîşk girêda. Birîndar nehiş ketibû. Li dû ra Baylozî got: »Birîndarî rakin û danên nav nivînan. Çar pênc mêran birîndar li nav hev ra kirin û wekî termekî rakirin û danîn nav nivînan. Destek nivînê baş û paqij ji birîndarî ra danîbûn. Gava ko birîndar danîn nav nivînan, hê jî birîndar nehatibû ser hişê xwe. Qawegerînan lûlehengekî zeng, tijî av bi legeniyekê va anîn, li ber Baylozî girtin û Bayloz pêş wê hindê da ko destên xwe bişo, destmalek ter kir û danî ser eniya birîndari. Bû îskeîska birîndarî û hate ser hişê xwe. Birîndar pêş da bi çavên beloqbûyî li dor û

berên xwe nihêrî. Lê paşê xûyeke sar li ser ra avît û bû nalenala wî.  
Emer

Axa hat û li ber serê wî rawesta û gotê:

»Li ber xwe bide kurê baş! Êdî kuta bû. Apê Baylozî tu rizgar kirî. Êdî tu ji mirinê filitî. Çi hizrên nebaş jî neke. Tu mêvanê vê malêyî. Ta ko

birîna te baş qenc nebe, em nahêlin tu herî. Hemîn apê Baylozi jî dê seriyar li ser te neqetîne.«

Birîndarî xwe nehişiyê avîtibû. Çi bersiva Emer Axayî nedida. Emer Axa zivirî ser ciyê xwe. Li wê navê da Baylozi jî destên xwe pak şoşt û hat

û li rex Emer Axayî rûnişt.

Deng û rengê êla Emer Axayî hatibû guhestinê. Te digot qay zemawendeke giran li nav êlê da dest pê bûye. Komel hemû keyfxoş û dem-

saz bûn. Du, sê roj li ser wê bûyerê ra bihorî bû, ko şivan hatin û gotin:

»Dijminan hê nehatine, termên kuştîyên xwe nebirine. Bêhina genî  
178 BILÎCAN

ketiye terman û term hemû kurmî bûne.«

Emer Axa hate ber serê birîndari û gotê:

»Em dizanin ko tu serekcerdî. Ev çend roj li ser ra bihorîne, lê hê kesek

ji êla we nehatine û termên kuştîyên we nebirine. Term hemû li ber ger-

mayê xerab bûne. Lawo em hevhesîne. Hevhesiyan her li berê da mêt ji

hevdu kuştine. Eger destûra te hebe, bila çend kes herin û termên kuştiyên we bînin û hema li nav goristana me da çal bikin. Bila her ter-

man li vir bispêrin axê.«

Birîndarî çavên xwe da ser hev û serê xwe zivirand û got:

»Hûn bixwe dizanin. Hûn çawa dikin, bikin.«

Îca bi wê gotinê ra lihêf kişande ser çavên xwe û serê xwe kire bin lihêfê

da.

Emer Axa ferman da û got:

»Sî, çil siwar û peya herin, wan termena bidin ser darbestan û bînin li

nav goristana me da bispêrin axê!«

He di gavê da, sî, çil siwar û peya bi hev ketin û ber bi geliyê çûn.

Bêhin

ketibû terman. Bêhnê bi fersexan rê dipîva. Mirov li ber bêhnê nedişiya

li ser terman bikeve. Mêş û moz li ser terman berev bibûn. Du, sê term jî

kurmî bibûn. Qilevila kurman bûn li nav hev da digeriyan. Komelê darbest girêdan û term danîne ser darbestan û ber bi zoma Emer

Axayî

zivirîn. Darbestên kuştîyan hema yeksere birin û li nav goristanê danîn

erdê. Pêş da xwestin wan hema wisan neşoştî bi cilikan va çal bikin.

Lê

Mela Osman, melayê zomê nehîşt. Bi gotina Mela, kuştî rût kirin.

Mela

li ser mirîşoyan ra rawesta û kuştî bi ser û ber bi wan da şûştinê.  
Term hil-  
hilîbûn. Nedihatin şûştinê. Mirîşoyan bi zor û zehmet kuştî şûştin û  
her  
yekê kefenek li serê wana werkirin û ewan rêz li rex hev li goristana  
zomê  
da çal kirin û pişta xwe danê û zivirîn û hatin dîwanxanê.  
Dema birîndari roj bi rojê baştir dibû. Ji wî ra çadirek cuda li rex  
konê  
dîwanxanê vegirtibûn û du nobedar jî dabûn ber derê çadirê.  
Baylozi du  
rojan carekê dihat û birîna wî vedikir, bi nivîşkê palaftî birîn dişoşt  
û ser  
ji nû destek destnêrmik dadinê ser birînê û ew dîsan weke her car bi  
ser û  
ber girê dida.  
Sê heftiyên xişt li ser roja cerdê ra derbas bibû, ko çar pênc siwarên  
ne-  
nas hajotin ber derê mala Emer Axayî. Du melayên şaşikkever jî li  
nav  
wan Siwarana da dihatin xûyanê. Meyteran banz dan û serên  
hespan ra  
girtin û hesip birin tewlexanê. Neimetê Îsi jî weke her car li pêşiya  
mê-  
vanan ket û ewan ber bi dîwanxanê rênimûnê kir.

179

BILÎCAN



Mêvan li ber derê dîwanxanê rawestan û silav dane komelê. Emer Axayî silava mêvanan vergirt û ciyê rûniştinê nîşanî wan da. Mêvan rêz li

rex hev rûniştin. Emer Axayî serçavanî da mêvanan. Mêvanan zor bi tore

û li ser xwe bersiva serçavaniya Emer Axayî dan.

Mela Osman melayê êla Emer Axayî, herdu melayên mêvan bi nav nas

dikir. Yek ji wan Xoce Demir, pêşnivêjê êla Deniz Begî bû. Mela Osmanî

çav li Emer Axayî kir û Emer Axayî hilda. Paşî vexwarina qaweyekê, Emer Axayî berê xwe li ser Xoce Demir da kir û jê pirsî:

Dey Xoce bêje ka çi heye? Çi tune ye? Ha bi xêr ji kêve?

— Ezbenî xweşiya canê te. Tişte kewisan tune ye.

Lê neşiya gotinên xwe bidomîne. Destên xwe miz da û çokên xwe guh-

est û ciyê xwe xweş kir. Rûyê wî nedigirt bêje ka ji ko tê. Serê xwe kire ber

xwe da û paşê herwisan ko serê wî li ber da bû û li erdê dinihêrî, got:

»Ezbenî, Deniz Begî em rê kirine xizmeta we. Deniz Begî gelekî hûn silav dikirin û digot cahilan nezaniyek kirine, bala bi mezinaya xwe bibexşîne. Bila li gunehê Îldirim Begî bibihore...«

Emer Axayî got:

»Xizmet pêdivî nîne! Cerda xwe dişîne, talanan dikişîne û li ser da dişîne daxwazî û bexşîşan. Belke cerda we nêzeyek li revîvanê min bidana. Kurê xelkê bû, minê çi bersiva êl û xizm û kes û karên wan bida.

Ca eger ev bûyera berewajî biba, axo Deniz Begî dê dîsan jî bişanda daxwaziyê?»

Emer Axa tûre bibû. Dengê wî li dîwanxanê derdiket û belawî nava zomê dibû.

Xoce Demirî got:

»Ezbenî tu rast dibêjî. Ez jî mafî dideme te. Lê taze kareke qewimiye. Evê kêmasî û nezanîna cahilan li me bibihore. Kareke debiya nebûya,

taze ko bûye û qewimî ye, ji me bibihorîne. Ji gunehên Îldirim Begî der-

bas be! »

— Xoce yarî nîne, pênc mêr hatine kuştinê. Xwîna pênc mêran rijiya ye. Ez çî carê evê hindê napejirînim. Me Îldirim Begî jî nedîtiye. »

Xoce li nava birû û bijangan da avirek da komelê û got:

— Ezbenî em bo çî tiştî nehatine. Tenê hegera hatina me eveye, ko em

peyama aşitiya Deniz Begî ragehînin xizmeta te. Sî cuzû Quran kem, ruha Deniz Begî jî hay ji vî karî nebûye. Roja qewimînê ez û Deniz beg

em herdu jî li mal nebûn. Em herdu jî çûbûne bajari. Bi sedan kesî em li

bajari da dîtine. Hemû gowane ko em li roja bûyerê da li mal nebûne.

180 BILÎCAN

Cahilan bêy agadariya me ev karê hanî ne li rê kirine.

— Xoce tu biçûkan şîret nakî, ku! Ro nîro sî, çil kes ji nav zoma mirovî

bi çek û rextên şeri va siwar bibin û rikêfî ser terş û talanên xelkê bikin,

mirov agah pê nabe? Taze kurê wî yê mezin jî serekcerde. Xoce niha eger

pûşikek ji êla min ji cî bileqe, ez pê dihesim. Ew çawa hay ji vê bûyerê

nebûye.

— Ezbenî xuda bixwe gowa ye. Min çawa hêşka erzî xizmeta we kir, li

roja bûyerê da ne ez, ne jî Deniz beg, yek ji me jî li mal da nebûye.

Mela Osmanî jî li ser bayê Xoce axift û got:

»Axa taze kareke bûye, bi mezinaya xwe evê hindê bide seb xatirê mê-

vanan. Ez daxwazê ji we dikim. Kareke taze qewimî ye. Her bide seb xatirê van mêvanan û vê komela xwe û ji gunehên Îldirim Begî derbas

be!«

Mamê Îs û du, sê ridênsipiyên dî jî hatin alî Mela Osmanî û li ber Emer

Axayî geriyan. Gelekî li ber hevdu dan. Emer Axayî nedipejirand.

Gencek li nav rêza mêvanan rabû û hate destê Emer Axayî û got:

»Evê nezanîne ji me bibihore!«

Emer Axayî nehîşt ew genca destên wî maçê bike. Destên xwe paş da

revand û got:

»Taze hûn hemû dibêjin, ez vê carê ji gunehên Deniz Begî û Îldirimî derbas dibim. Lê careke dî ev bûyera biqewume, ez çi carê napejirînim.

Eva ya cînaretiyê nîne. Em cînarên hevin...«

Piştî demeke xurt ko Emer Axayî hêrsa xwe rijand,berê xwe li ser Xoce

da kir û li wê demê da ko destên wî derva nîşan dida, got:

»Îldirim, waye li çadira han daye hûn dikarin pê ra biaxivin.«

Xoce destê xwe da sîngê xwe û got:

Zor sipas û bi gotina xwe ra ji cî rabû û çend kes ji mêvanan jî bi wî ra

rabûn û li dîwanxanê derketin û Neimetê Îsi li pêşiya wan ket û çûne çadira Îldirimî.

Îldirim li nav nivînan da diqilqilî. Xoce li be serê wî rûnişt û lihêf li ser

çavên wî rakir. Ew nerazabû. Xwe xew ra avîtibû. Gava ko Xoce lihêf li

ser çavên wî avît, çavên xwe kuta nav çavên Xoce. Xoce xwar bû û pêşeniya wî maç kir û li rewşa wî pirsî:

»Tu çawa yî? Tu li ber birîna xwe aciz nînî?«

Îldirim ji cî hilqedimî û bersiva Xoce da:

— Na Xoce efendî Emer Axayî barekî giran danî ser stuyê me. Birîna min lap qenc bûye.«

181

BILÎCAN

Li dû ra hevalên Xoceyi jî yekoyeko hatin û çûn li ber nivînê Îldirimî û

ew maç kirin. Îldirim li nav nivînan da hilqedimî û li ser xwe rûnişt.

Paşî

bîstekî Xoce û hevalên wî zivirîn dîwanxanê û bi destûra Emer Axayî

Îldirim jî di gel wan hat û li rex Xoce rûnişt.

Li dû ra firavîn hat. Dîsan wekî her car firavîn berdane nav curinan.

Vê

carê birinc û zexmegoşt û dûvê beranan li nav curinan da bûn qûç.

Komel kişiyane ser curnan.

Paşî xwarin û vexwarinê, Xoceyî berê xwe li ser Emer Axayî da kir û got.

»Emer Axa te barekî giran danî ser stuyê me. Niha eger destûra we hebe, emê ji xizmeta we murexes bin.«

Emer Axayî li bersiva wî da got:

»Tikaye Xoce! Her gava dilê we bixwaze hûn dikarin herin. Lê bi min wereng birîna Îldirimî hê baş qenc nebûye. Nojdarên we hene, yan na?

— Erê ezbenî nojdarên me hene, lê ya rastî, nojdarên me destê Baylozi nagirin.

— Başê, çi nake. Ezê bêjim bila Bayloz jî heftiyê carekê bê û li birîna Îldirimî binêre.

Xoce rabû, qesda destê Emer Axayî kir. Emer Axa yek bi bejna xwe va

li ber Xoce va rabû û nehîşt ew destên wî maçê bike. Li dû Xoceyî ra Îldirim jî rabû û xwe avîte ser dest û piyên Emer Axayî. Lê Emer Axayî

nehîşt ew jî destên wî maçê bike. Milê Îldirimî yê rastê pêva darda bibû.

Hê baş nikarî milê xwe rakira. Emer Axayî hemû li ciyên wan da, da rûniştandinê. Bi lêniqandina Emer Axayî ra Neimetê Îsi destek cilikên

nû li nav buxçikekê da anî û li ber Îldirimî danî. Xoce û hevalên wî alî hev

kirin û cilkên nû li Îldirimî kirin. Li dû ra Emer Axayî gote seyîsan:

»Hespên mêvanan amade bikin!«

Li dû gotina Emer Axayî ra Xoce û hevalên wî û Îldirim ji cî rabûn.

Emer Axa û komela dîwanxanê jî bi wan ra rabûn. Xoceyi got:

»Emer Axa te barekî giran da ustuyê me. Em ta mirinê jî nikarin ji ber

vê qenciya te derkevin. Vêca bi xatirê we. Tikaye fermon, rûnên.«

Îca bi vê gotina xwe ra ber bi derê dîwanxanê çû. Emer Axa û komela

xwe jî pê ra derketin derva. Li ber derê dîwanxanê, ji hespên mêvanan

pêve, şeş hespên dî jî bi zîn û pûsadan va amade bûn. Yek ji wan şeş hes-

pana hespek bû, ko Emer Axayî ji Îldirimî ra dabû zîn kirinê. Lê pênc hespên dî, yên kuştiyan bûn. Bi destûra Emer Axayî cil û bergên koştiyan

hema wisan bi xwînê va li nav buxçikan da girêdabûn û havîtibûn terkiya

hespên wan. Mêvan li hespên xwe siwar bûn û hespên kuştiyan jî kirin

182 BILÎCAN

êrdeka hespên xwe û malavayî ji Emer Axa û koma wî kirin û zengî li hes-

pên xwe dan û çûn.

Piştî heyvekê teteran bîst beran anîn der mala Emer Axayî û gotin,  
ko

Deniz begê sibê bê gerdenazayiyê ji Emer Axayî bixwaze û li ciyê  
dijmi-  
natiyê da dostaniyê danê.

183

BILÎCAN

24

Piştî çûyîna mêvanan û dostaniya herdu gelan, Emer Axa giştî  
giregire û  
ridênsipiyên êla xwe gazî kir û mêvandariyeke giran li ser Kerr û  
Kuliki

danî. Kerr û Kulik li jorî dîwanxanê li rex Mamê Îsi rûniştibûn.

Du genc, du fêriz, du lawên tazegiheştî, taze bejinvedayî, du xortên  
taze

berê simbêlên wan xûyî dayî, du pehlewên bi milên hev ra, li serê  
dîwanxanê, li ser perê koma giregiran mil kutabûn hevdu û li ser  
darê

edebê li ser çokan rûniştibûn. Di dîwanxanê da bi hezaran çav, li ser  
bejn

û bala wan, zend û bendên wan, li ser tefeşa wan da direqisîn. Giştî  
dîwaniyan çav kutabûn wan herduyan. Kerr û Kuliki xwe li jêr  
giraniya

hezaran çavî da didîtin û giraniya hezaran çavî li ser leşên xwe seh  
dikirin.

Herduyan jî serê xwe kiribûn di ber xwe da.

Li nav êla Emer Axayî da deb bû, ko eger rê û şûneke taybetî haba,  
ji-  
nan jî dikarîn li pişt perde û çîten dîwanxanê da rawestin û li wê rê  
û şûnê,  
yan li wê bereviyê mêze bikin û axiftinên wan guhdarî bikin. Ca gava  
ko  
li nava zomê da bû dengî, ko îro mala Emer Axayî bonetî mêranî û  
mêrx-  
asiya Kerr û Kulikê lawên Werdekê li ser wan mêvandarî daniye, û  
Emer  
Axa dixwaze wan herdu gencana bi pehlewantî bi komelê bide  
nasînê, û  
rêzgiriya mêraniya wan bike, koma jin û qîz û bûkan li pişt perde û  
çîten  
dîwanxanê da lev civiyan.  
Piştî firavînê, Emer Axayî ciyê xwe guhest. Çarmêrkî rûnişt û pala  
xwe  
da palgî û berpalan. Du, sê caran bi dengekî bilind xwe kuxand û  
gewriya  
xwe paqîş kir û got:  
»Gelî komela hêja û giranbuha! Gelo hûn dizanin ko min roja îro  
çima  
hûn gazî kirine?«  
Îca hêviya bersivê va nema û bixwe bersiva xwe da:  
»Min roja îro hûn li vê bereviyê da top kirine, ko hûn di gel cotek  
pehlewane min î xoşdevî nasiyar bibin. Min ev mêvandariya  
bonetî van  
herdu gencana daniye.«



Îca bi tiliya xwe ya amanalês herdu bira nîşanî komelê da. Mamê Îsi hêdîka gote Kerr û Kuliki:

184 BILÎCAN

»Rabin şipê! Rabin şipê!«

Kerr û Kulik bi gotina Mamê Îsi ra rabûne ser xwe. Bi hezaran kesî çav

kutane ser Kerr û Kulikê Silêmanî. Hezaran çavî hêrişî ser çavên wan kirin. ewan hêrişa hezaran çavî bi hev ra li ser çavên xwe seh kirin û serê

xwe kirin ber xwe da. Te digot qay çavên wan dîwaniyan ji wana ra bar

nagire. Çavan çavên wan dixwarin. Erê çav xenîmên xwe nas dikin.

Kerr

û Kuliki li çavên wan da dixwendin, ko her yek ji xudanê wan çavana di

dilê xwe da digotin:

»Xeta meta nebû, ko ev herdu revîvanana du, sê diz birîndar kirin.

De

îca Emer Axa Xudê ji babê te xweş nebe, dar li kewê neket, kew li darî ket

û ev herdu kurikana, dizek birîndar kirin. Vêca ev hemû mizaxtin û mes-

refa giran ji bo çiye? Ma ta niha qet çi revîvanî diz dîl negirtine, ters û ta-

lan nezivirandine, îca te çima hema li ser van herdu kurikana mêvandarî

giran kir?«

Ev gotinan li nav gelek seriyên da digeriya û gelek çavan gowayiya wê hindê didan. Lê kanê kê diwêre, ya di dilê xwe da derxîne eşkeretiyê. Kê dikare li tirsê Emer Axayî da evê raza dilê xwe ser veke? Ev xeberana ji de- vê kê ra derkeve, Axa yê zimanê wî di qulqulîkê da bibire. Yê zimanê wî li patika wî ra bide derêxistinê. Komelê hemûyê xwe keyfxoş nîşan didan. Li dema ko Emer Axa diaxift, Koma qîz û bûk û jinan jî, li pişt perde û çîten dîwanxanê rawestabûn û li qelşên çîtan ra, li celxên konan ra, derva dîna xwe didane hundurê dîwanxanê û Kerr û Kulik bi tiliyan nîşanê hev didan. Yek ji wan qîz û jinên ko li pişt perdên dîwanxanê ra dîna xwe di- da Kerr û Kuliki, Perîşana qîza Emer Axayî bû. Perîşan di gel dayîka xwe û keniza xwe Macana Cano rawestabûn û li dîwanê û dîwanxanê dini- hêrîn. Li demekê da Perîşan û Macanê hev girtin û bi ken û yarî û henek kûşkê ji komê dûr ketin. Macanê gote Perîşanê: Li wî alî, rûmetê Kerrî ketiye ber sîberê, em wî alî baş nabînin. Were em li qelşa pêşberî Kerr û Kuliki ra dîna xwe bidine wan! »

Perîşanê lê zivirand û gotê:

»Qirikê! Porên te kur nebe, bavo yê me bibîne.«

— Na, na, Axa waye bi komelê ra diaxive. Em ko tenê nînin, waye jinên êlê hemû dîna xwe didine wan.

— De were, em herin.

— Ka kî alî da rûmetê wî baş tê xûyanê?

— A, li vêderê ra. A, li vê qelşa konî ra berê wî ketiye me.

Keri nişkava dît ko celxa konî ya peşberî wî fire bû û ronahiyê bînanî

185

BILÎCAN

şûrekî, durust weke şûrekî tûj tarîtiya nîveka konî birî û kete ser çavên wî.

Li dû ra reşekê xwe da ber wê ronahiyê. Çavên Kerrî li qelşa konî ra li nav

çavên Perîşanê ket. Heman ew berqa ko sê, çar salan berî niha gava ko

Kerr û Kulik bo cara yekê hatibûn dîwanxanê û li ber derê konê aliyê malê rastî Perîşanê hatibûn, dîsan li bîbika çavên Kerrî firî û li nav çavên

Perîşanê da rûnişt. Ewê berqa caranî leşê wî jî dagirt. Dilê wî lerizand.

Serê wî bêy hemdê wî kete ber da.

Gava ko çavên Perîşanê li celxa konî ra li nav çavên Kerrî ket, dilê wê jî

lerizî. Hema bi berqa çavên Kerrî ra zûka qelşa konî da hev û hema wisan

li cî da rawesta û guhên xwe li dîwanxanê dagirt.

Emer Axayî hê bi gef û gur diaxift û digot:

»Ji îro şûn da êdî ev herdu gencana, ev herdu zilamana revîvan nînin.

Ewan hêjayî wê hindêne ko di dîwanxanê da rûnên û çokên xwe bidin

çokên ridênsipî û mêrxas û giregiran. ewan êdî ji îro şûn da pehlewanên

êla me têne hejmarê.«

Emer Axayî li dû ra berê xwe li ser herdu gencan da, ko hema wisan li

ser piyan rawestabûn, kir û got:

»We herdu birayan serê me li nav komelê da, li nava dost û dijminan da

bilind kir. We em serferaz û serbilind kirin. Ev komela min îro hemû bi

mêraniya ko we kiriye, dizanin. Ew hunurê ko we kiriye, ta roja îro kesî

nekiriye. We serekcerdekî wekî Îldirimî, ko gerdenistûriya giştî hoz û êlên

navçê fikir, tewand û we ew li ser çokan xist. Hûn bûn hokarê wê hindê

ko Deniz were li dîwanxana min da li pêş çavên heft, heşt hozên navidar

da, xwe bavêje ser dest û piyên min û dawaya lêbihorînê ji min bike. We

herdu birayan serê me li nav giştî welati da bilind kir. Ji îro şûn da hûn

dikarin bi navê pehlewan û mêrxasên êla min, serbest bêne dîwanxanê û

tevaya giştî berevî û şêvrên me yên ramiyarî û dîwanî bibin.«

Gava ko Perîşanê ev gotinane li pesna Kerr û Kuliki da ji devê bavê xwe

dibihîst, dil hebû per deraniya û bifiriya. Te digot qay bi van qisana giştî

cîhana pan û berîn pêşkêşî Perîşanê dikin.

Li dû axiftinên Emer Axayî ra, Kerr destê xwe da sîngê xwe û got:

»Ezbenî me xizmeteke wisan giring nekiriye, ko hêjayî van hemû dilo-

vanî û pesinana be. Her tenê me erka li ser milên xwe bi cî aniye.

Me li

himber hêrişên neyaran da bergiriya xwe kiriye.«

Emer Axayî ew herdu dane rûniştandinê. Û li dû ra got:

»Na, hûn ji wê hindê jî zêdetirin. We şîrhelaliya xwe nîşanî komelê da.

We bi mêraniya xwe ji min û ji vê komelê ra binecî kir, ko hûn hêjayî

186 BILÎCAN

pehlewantî û şêvirdariya dîwanxanêne.«

Gimegim kete dîwanxanê:

- Şîrên wan helal e.
- Mêrikan emekdarin.
- Ji maleke xerab nînin.
- Erê, erê nebiyên Eliyê Mîr îin.
- Gîha li ser rehê xwe şîin dibe.
- Yê bikişînin kal û bavên xwe.

— Mêrikan xalanên wan jî hemû pehlewan û zor û zorbe ne.

— Xalanên wan kî ne?

— Lawên Hesê Dûdêyîne.

— A, Hesê Dûdêyê Êzdî?

— A, a, mêrikan hemû mêrxas in.

Xarzî ji xalane, kurûk ji falane.

Li hundurê konî da, dengê gotegot û pêkenîn û yarî û laqirdiyan  
têkelî

hev bibûn. Îca deng lev siwar dibû û wekî pêlên deriyayeke pir pêl  
û şepêl

deng vedida û dengê mêran dikete çil û çiyar. Kesî dengê kesî  
nedibihîst.

Êla Emer Axa pêk dihat ji heşt hozên mezin. Ku her hozek zêdetir ji  
hezar

malî bû. Li wê rojê Emer Axa giştî mêrên heşt hozên êla xwe li ser  
Kerr û

Kuliki da mêvan kiribû. Serê malê mêrek li dîwanxanê da top bibûn.  
Ji

heşt hezar mêran zêdetir li dîwanê da berev bibûn. Her yek eger  
carekê

bikuxiya, dibû heşt hezar car. Her yek carekê bikeniya dibû heşt  
hezar

car. Komelê her yek bi curekî keyfxoşiya xwe nîşan didan. Lê pişka  
zore

wan her diro da û li ser dilê Emer Axayî da diaxiftin. Pişka zore wan  
goti-

nana her bi teqil û ahenga xwe va diyar bûn, ko ji ciyekî vikî vala

derdikevin. Deng û hera û gotegot li hevdu siwar dibûn û zimezim  
dikete  
dîwanxanê. Ken û gotin û kuxiyan û bênişîn û şabûn û xem û Kerrb  
û kîn  
û evîn û pesin û laqirdî û yarî û pirs û pirsiyar têkelî hev bibûn. Deng  
ve-  
didan. Ser hev û ber hev ra diçûn. Pêl vedidan û ji dîwanxanê  
derdiketin  
û belawî axaran dibûn.

Emer Axayî weke caran xwe kuxand û berê xwe li ser komelê da kir  
û  
got:

»Gelî komela hêja tikaye bêdeng bin!«

Te digot qay kevirek avîtin nav gola req û beqan. Hemû tev kir bûn.  
Emer Axayî berê xwe li ser Kerr û Kuliki da kir û got:

»Gencên hêja! Bêjin kanê daxwaz û mirazên we çine? Ez dixwazim  
li vê

bereviyê da ji bo wê mêraniya ko we kiriye, we herdu birayan xelat  
bikim.

187

BILÎCAN

Lê hûn herdu serpişkin. We çî xwest, bi gowayiya vê bereviyê ez  
xwe ji

daxwaza we nahêvişînim. Hûn dilbixwazin.«

Keri bersiv da:

»Ezbenî, me erka xwe qedandiye. Em canxweşiya we dixwazin. Li  
saya

serê te û Mamê Îsi û vê bereviya hêja da, em hewcedarê çî tiştî nînin.

Daxwaza me her serferazî û xweşiya te û gel û komelê û pêşdaçûna we-  
latiye.«

Lê Emer Axayî nepejirand û got:

»Na ya bûyînê nîne. Debê ko hûn tişteke ji min bixwazin. Bêy xelat nabe. Min pêxweşe ez ji devê we bibihêm.«

Birûskan Neimetê Îsi avîtibûn nav hev û di dilê xwe da digot, ma nabe

hema ev herdu sewlikana bikin nemerdî û bêjin em Perîşanê dixwazin.

Neimet li ciyê xwe da neditebitî. Carê carekê radibû, ciyê xwe diguhest

û dîsan dihat û li ciyê xwe da rûdinişt. Eger ji Emer Axayî netirsiya û ji

komelê şerm nekira, yê bigota de îca Emer Axa Xudê ji miriyên te xweş

nebe! Ev herdu revîvanana hêjayî xelat melatan nînin. Te serê komelê gêj

kir. Du revîvanin. Ma çî kirine, ko tu hind bi bejin û balaya wan heldibêjî!? Xudê ew mirî hêjayî vê şînê nîne. Lê ji xwe ra nedidît.

Kuliki hêdîka li ber lêva xwe da gote Kerrî:

»Kuro mahîna Barxane û herdu caniyên jê bixwaze!«

Emer Axayî dîsan berê xwe li ser wan da kir û got:

»Şermê nekin, lawên delal! Ka daxwaza we çî ye, bêjin. Hûn ji bo çî şermê dikin?«

Kerr dîsan rabû ser piyan û destê xwe da sîngê xwe û got:



»Her çend ko em hewceyî tişteke nînin jî, lê çunku Emer Axa hinde pêkutaniyê dike, eger ya bûyîne be, em mahîna Barxane û herdu caniyên

wê dixwazin.«

Emer Axayî got:

»He hind! Wakî we nexwesta jî, minê ew her sêkana pêşkêşî we bikira.

Bila li we pêroz û bimbarek be!«

Bi gotina Emer Axayî ra şîrqîn kete komelê û hemûyê pêkve gotin :

— Pêroz be!

— Bimbarek be!

— Xudê mirazên we pê bike!

Birûskên li ber dilê Neimeti sar bûn. Ewî jî li ser hev digot:

Pêroz be! Pêroz be!

188 BILÎCAN

25

Taze cîhan li ronahiya tavê û li germaya tirîşkên wê da noqim dibû,  
ko

meysteran mahîna Barxane zîn û pûsad kirî, bi cotên caniyên va, anîn  
ber

derê mala Werdekê. Mahîna Barxane, bi cotên caniyên va hefsarê  
wan li

destên meysteran da li ber derê mala Werdekê wekî birûskekê şîhiya  
û be-

ra xelkê êlê hemûyê li ser xwe da rakêşa. Jin û zar û pîr û kal hemû  
ji

hundêrê konan derketin temaşa wan. Mahîna Barxane ser û dêlên  
xwe

kiribû yek. Herdu caniyên jî weke du karên xezalan dabûne dû wê.  
Herdu canî êdî qert bibûn. Sosik dêlberdayî bû. Taze enam lêdida.  
Lê

Nijdî pê kutabû sê saliyê. Ew caniyekî nozîn bû. Kuliki taze wê salê  
ew

hîmandibû. Sê, çar heyvan berî cerdê bû, ko Kuliki toratiya wî derx-  
istibû. Nijdî salekê ji Sosikê biçûktir bû, lê hindik mabû li ser Sosikê  
biketa. Ew li Sosikê bi dest û pêtir bû. Sosik mahîneke nazik û  
navzirav û

nazenîn bû. Durust bînanî xezaleke sil û revok, tîjbal û rehwan bû.  
Çîpên

wê zirav û qelemî, saxiriyên wê pir û qelew, bejna wê bilin û raçandî  
bû.

Maka wan mahîna Barxane kehêleke erebî bû. Emer Axayî bixwe  
ew li

bazara Helebê bi pênc kîs zêrên zer kirîbû. Hespên weke mahîna  
Barxane

kêm peyda dibûn. Her kesî nikarî mahînen weke wê bikiriyana. Lê  
pênc

kîs zêrê zer ji Emer Axayî ra weke pênc dirafan bû. Eger kes yan  
kesanekî

bixwesta mahîneke weke mahîna Barxane bikiriyana, debiya ko  
çend

heval peyda bikiran. Kesekî tenê nikarî mahîneke kehlan bikiriyana. Bo  
nimûne çar kes dibûne heval û serê kesê kîsek zêr didanîn û  
mahînek

dikirîn. Bi gotina wan bixwe her yekê lingekî mahînê dikirîn. Her lingê

wê bi kêsekî sed zêrî. Îca ew çar kesan ew mahîn weke qîzeke kezî li pişt

çît û perdan da xudan dikirin. Mafê kesî tunebû li wê mahînê siwar biba.

Ew mahîn tenê ji bo wê hindê dihate kirînê, ko caniyên li ber bigirin. Li

kêderê hespekî bi nav û deng heba, bi rêka heftiyên rê dipîvan û nêrî û be-

ran pêşkêşî xudanê wî hespî dikirin, ta ko destûrê bide, mahîna kehlan li

ber hespê wî bidine kişandinê. Ca bi vî cureyî salê caniyek li ber wê mahînê digirtin. Li yekimîn heftiya caniyê da ew pişk davîtin. Ew canî ji

kê ra derketa, ew ji cêrga pişkavîtinê derdiket. Lê wê salê dibû berpîrsê

189

BILÎCAN

xudankirina mahîn û caniyê. Bi vî cureyî ta çar zikan her yek dibûn xu-

danê caniyê kehlan, yan hespekî erebî, mehnegiyekê, seglaviyekê. Ca li

dû ra ew mahîn dibirin bazara beytaran û buhayê wê didane diyar kirinê

û yekê ji wan ji xwe ra hildida û parên ewanên dî didayê. Yan jî hema li

bazarê da difirotin û parê wê parve dikirin. Lê ewê ko dibû binpişk  
lap li  
xwe da dişewitî. Gerek bû sê salên xişt zikê xwe miz bida û çavnehêrî  
piş-  
ka xwe ba û li sala çarê da jî dîsan gereke bendewar bima. Vêca ta  
ko  
mahîne fal bigirta, duwanzdeh mehan canî li zikê xwe da xudan  
bikira,  
piştî duwanzdeh meh û duwanzdeh şewerojan û danzdeh  
demijmêran  
firk biba, canî mezin biba û biba caniyekî şîre, ewê serpişk, li hespê  
xwe  
yê erebî siwar dibû jî. Ewê binpişk debiya sê salên dî jî bêhinfirêtî  
bikira,  
sê salên dî jî zikê xwe miz bida, xwîna dilê xwe bixwara, canî bi  
xwîna dil  
û ronaya çavan xudan bikira, da ko caniyê wî, yan caniya wî mezin  
bibin,  
bibin şîre. Li şîretiyê derketa bibin biriye. Li biriyetiyê derketa bibin  
nozîn û  
dêlberdayî û ji suwarî û hîmkirinê ra amade bibûya. Ewê binpişk li  
ser  
hev gerek bû, heft salan rawesta. Heft salên xişt bêhinfirêtî bikira,  
ta ko  
dibû xudanê hespekî erebî, yan mahîneke kehlân.  
Ew jî bext û hate. Sûcên hevalên wî yên dî di vî karî da tune. Bila  
bex-

tê wî jî lêda û yekimîn canî ji wî ra derketa. Kesî ko kum nedabû serê wî.

Ew ji nehatiya wî bû, ko bibû binpişk. Ew rê û şûneke giştî bû. Kes nikarî ji wê rêkê derketa.

Erê her kesî nikarî li hespên wisan yan li mahînên wisan siwar bibana.

Her tenê xan û beg û serokhoz û mîr û mîrekan dikarîn li hespên wisan,

li mehnegî û seglaviyên wisan siwar bibana. Pêşyan gotine: Hespê çê mi-

raz e. Lê hespên wekî mahîna Barxane û Sosik û Nijdiyan mirazê li ser

mirazan ra bûn. Ji hespên wisan ra bayê bezê digotin. Pêdivî bû ko mirov

bişya li ser biketa. Lingên xwe li zengiya wan da cî bikira. her piyên mirovî li ser pişta wan biketa, êdî mirov giheştibû miraz û mebestan.

Mexseda te her kê der dibû bilanê. Şam, Heleb, binê Beriyê, çiyayê Şengarê, Têhran, Tewrêz, Istenbol, Enqere, Mûsil, Bexda, her ciyê ko te

miraz bikira. her pêdivî bû ko te berê wan bida oxirê. Êdî tu li demê da

giheştibûyî mebesta xwe. Te heval û hevrê hemû li dû xwe ra hêlabûn û

tu li pêş hemûyê ketibûyî. Mebesta te li binê cîhanê da jî ba, xema te

tunebû. Suwarên van cure hespana li nav komela giştî da jî xudan  
rû û

avirû û rêz û sengiyeke taybetî bûn.

Eger li komela niha da, li çawaniya cil û berg û timtêl û pûs û ereba  
mirovî dinêrin û rêza mirovî gorekî solika piyên mirovi, gorekî şal û  
şapik

190 BILÎCAN

û kum û kulavê serê mirovi, yan tûmika mirovî ya şe kirî û kiravata  
mirovî ya keşxe û ereba mirovî ya nûmodêl digirin. Berê rêz û  
sengiya

mirovî gorekî hespa li bin mirovî da digirtin. Tu her kî dibûyî, bibayî.

Li

te û navê te û zanîn û zanist, agadarî û jêhatbûna te nedinêrîn. Li  
ser û

dêlê hespê te, li zîn û pûsadê hespî, li timtêl û rewşa hespê te û  
temîzî û

bereya wî yan wê mêze dikirin û paşê gorekî rewşa hespê te rêz li  
te di-

girtin. Nanê suwarên kihêl û mehnegî û seglaviyan, tim û tim li nava  
rûnî

da bû. Suwarên wisa li ber derê mala kê peya biba, bêy wê hindê ko  
nas

bikirana û bizaniyana, ji ko tê û kuda diçe, jê ra kar û berx û golik û  
elok

ser jê dikirin. Lê wakî tu begê êleke giran nebûya, tu kurê şah û  
padişa-

han jî bûyay. Tu pehlewaneke navidar û mêrxaseke biwêr bû.  
Baldaran bi  
bihîstina navê te per biweşanda. Şêr û pilingan bi dengê te ra pûrtr  
bi-  
werandana. Tu zanayekî navdar û naskirî bûya. Tu Eflatonê demanê  
û  
Calînos û Loqman jî bûya, lê tu suwarê bergîreke bibay, çi kesî rêz û  
sen-  
giya te nedizanî û çi kesî rêz li te nedigirt. Eger tu suwarê hespek  
neçê bay,  
kesî tu li ber tiştê nedihejmartî. Te bajota li ber derê mala kê, yê  
gorekî  
rewşa hespê te, gorekî timtêla zîn û pûsadê hespê te rêz ji te ra  
bigirtana.  
Pişka zor li ber vê hindê bû, ko buhayê hespên çê gelekî li jor bû. Û  
her  
kesî nedikarî biba xudanê hespên çê. Lê Kerr û Kuliki bi mêranî û  
mêrx-  
asiya xwe ne tenê bibûn xudanê sê hespên bijare, belkû nav û  
dengê xwe  
jî belavî axaran kiribûn.  
Li dû wê mêvandariya Emer Axayî ra, êdî ewan neçûn ber revoyê.  
Revîvanên dî girtin. Kerr û Kulik êdî bûn dîwanî û tevayî li şêvrên gi-  
ranên dîwanxanê kirin. Her roja ko şêvireke giran heba, Emer Axayî  
dişande dû wan herdu birayane jî.  
Êdî karê Kerr û Kuliki bû şêvirdarî û rav û nêçîr. Her roja ko şêvra  
dîwanxanê tuneba, li berbanga sibêdê da herdu birayan pêkve xwe  
tev

girêdidan û berî tav lêdanê, li Sosik û Nijdiyi siwar dibûn û berê xwe di-  
dane nêçîrgehan. Lê şêvra giştiya dîwanxana Emer Axayî her bizorê salê  
carekî heba û tuneba. Her çî şêvrên giran heba, her çî karên giring  
û ne-  
hînî heba, Emer Axa di gel maliya xwe Eyşanê û xwarzayê xwe Neimetê  
Îsi hildixist û dijwarî û gîr û girftên xwe bi arîkariya wana vediçirand.  
Hemû rojan sibêdeyan, cotek siwar ji zoma Emer Axayî derdiketin.  
Bi  
şingîna Siwaran ra yên xewar ji xew radibûn. Êdî wisan lê hatibû, ko  
hemû rojê xelkê zoma Emer Axayî bi dengê lingên Sosik û Nijdiyi ra,  
bi  
şingîna Siwaran ra ji xew radibûn. Êdî karê wan yên rojane bibû rav  
û  
nêçîr. Çi rojan destvala ji nêçîrgehê nedizivirîn. Roja ko destvala

191

BILÎCAN

biziviriyana malê, ew roj, ne roja wan bû. Rojê cendekek diçû ber  
derê  
mala Emer Axayî, yek diçû ber derê mala Mamê Îsi û yek jî dihate  
ber  
derê mala Werdekê. Pezkûviyek, Kerrkûviyek, xezalek, kêrûşkek,  
qazek,  
werdekek, çirgek, qet neba hema qurebeyteyek, yan çend kew  
nêçîr



dikirin.

Ev cotên Siwaran her roj sibêdan diçûn û êvaran dihatin. Hemû rojê jî,

sibêde û êvaran, berî çûyîn û hatina wan, bejneke bilind û şûşmanî, be-

jneke bi gêre û wêre, şox û şeng, şatirşûmanî, bejneke şûş û tenik, kem-

bereke zirav, cotek çavên reşbelek, cotek birû yên kêşayî, eniyeke pan û

kever, tefeşeke gurover, li ber derê mala Emer Axayî radiwesta û hatin û

çûyîna Kerr û Kuliki raçav dikir. Hemû rojê du caran berqeke dilbizvîn

û leşsimîn, berqeke bi soj û şewat, birûskeke agirîn, li nîveka du dil û çar

çavan ra derbas dibû û bêy wê hindê ko deng ji kesî derkeve, du leş li ber

tirîşkên wê berqê agirdadayî dibûn û dişewitîn.

Perîşan hemû rojê sibêdeyan, berî her kesî, ji xew radibû. Şitabek dida

bejna xwe ya şox û şeng. Xwe bi heft qeleman dinitiland. Kofiya zêran di-

da ber eniya kever. Fîstanên rengareng li xwe dikir. Kembera zîvîn li

navtenga zirav girêdida. kondera Amedê dikire piyên xwe, li ber pesêva

koni, li serê rêka Kerr û Kuliki radiwesta û li suwariya wan, beza hespên

wan, çek û rext û tevgirêdana wan mêze dikir. Êvaran jî berî hatina wan  
dîsan hema li wê derê radiwesta û rêka wan çav ra dikir. Eger rojekê Kerr  
û Kulik dereng bihatana, li nêçîrgehê da gîro bibana, erd û esmanan Perîşan nedihewand. Dibû tawûk. Xurpîn li binê dilê wê diket. Dilê wê  
dilerizî. Neditebitî. Dihat û diçû. Li demên weha da keniza wê Macana  
Cano li hawariya wê da dihat. Dildarî dida ber dilê wê û ew vedihewand  
û ew dida axiftinê. Rojekê dîsan Kerr û Kulik pir gîro bûn. Perîşan li ber  
pesêva konî da rawestabû û tirpetirpa dilê wê bû, ko Macanê xwe pê ra  
gîhand:

- Hema hindik maye bên. Bêgotin îro dîsan nêçîra wan giran e, lew ra gîro bûn.
- Ha, tu dibêjî qeziyayek nehatibe serê wan?
- Qeziyayên çi? Qet kul jî bi wan nikare. Mêrê mirinê ji wan direve.
- Tu Xudê kî, devê te çawa digere, tu ji wan ra wisan dibêjî?
- Perîşanê, ez pesnên wan dikim. Xudê ruhstîn jî ji wan ditirse. Du mûyên ruhistînî di nav çavên wan da ye. Ma te nedîtiye? Çavên wan çawa  
dipirûsin. Agir çawa li ber çavên wan difûre. Mirov ji wê pirûska çavên  
wan ditirse.

192 BILÎCAN

— Erê Xudê tu rast dibêjî. Pirûska çavên wan dilê mirovî disimîne.

— Leşê mirovî dilerizîne.

— Benda dilê mirovî dipizirîne.

— Mirovî ditirsîne.

— Bi pirûska çavên wan ra germayeke tund seranserî leşê mirovî dadi-  
gre.

— Mirov xwe bezir dike.

— Dilê mirovî bi tundî lêdide û tişteke li binê dilê mirovî da dişkê.  
Tişteke germ û dax. Tişteke sincirî. Xwazî me bikarîba hema carekê  
di gel  
wan biaxifta. Hema carekê min bi wî ra xeber bida, diqewimî agirê  
dilê  
min kûşkê sar biba. Lê ev Neimetoke ji me ra bûye milozim. Em kuda  
diçin, me dipê. Hema nahêle em ji dûr va ra jî li bejin û bala wan  
mêze  
bikin. Tu dîna xwe nadî wî, ew jî van rojana sibêdeyan zû radibe. Te  
duhûnê dît çawa qîlên xwe beş dikir. Ew bi tirane li me dikeniya. Bi  
min  
wereng ew ji tişteke hesiya ye. Ew ji her tiştê hesiya ye.

— Îca pê hesiya, yê çi şaşyan bike. Gotina me jî heye.

— Gotina me çiye Macanê?

— Eger ewî li vê barê da tişteke li ber guçkên Axayî xist, emê bêjin  
ew  
derewan dike. Ew bixwe li dû me digere.

— A, tu rast dibêjî. Hema rastî jî ew li dû me digere. Ma derew e.  
Demekê xwe kir kirin, paşê Macanê pirsî:

— Herê Perîşanê, tu dixwazî rojekê bi wî ra xeber bidî ?

— Bi kî ra?

— Bi Kerrî ra.

— A, ez ji Xudê dixwazim. Lê çawa? Li kû? Kêderê?

— Qet, ew li destê xûşka te da bînanî fireke avê ye. Zor hêsan e.

— Çawa ?

— Em ko nêçîrgeha wan nas dikin. Rojekê emê bi berhaneya pincarî,

yan bi berhaneya bindarûkê derkevin derva û herin nêçîrgeha wan û li newalekê da, yan li pesêva kevirekî da wana bibînin. Û tu dikarî bi dilê xwe bi wî ra xeber bidî.

— Porkurê lê wakî bavo bi me bihese çi?! Xudê yê porên me herduyan jî kur bike.

— Na, na. Emê wisan bikin, bila çi kes bi me nehese. Hemîn her sal jî li van deman da, em derdikevin bindarûkê. Emê îsal cîhê bindarûka xwe biguherin. Emê herin ser riya nêçîrgeha wan bindarûkê.

— Kiçê nêçîrgeha wan gelekî dû re. Ewan suwarî diçin. Em peyan e.

193

BILÎCAN

Peyatî rêka rojekê ye.

— Em ko naçin dernakevin nêçîrgeha wan! Emê herin serê riya wan, ji

xwe ra bindarûkê danên. Her çawa hebe, ewanê me bibînin û bi heji-

yareyên xodîkê jî mabe, ezê wan pê bihesînim.

— Xudê ez pir ditirsim.

— Ew tirsana li ber şabûnê ye.

Herdu tev kenîyan û çûne hundurê koni. Dîna xwe danê Neimet waye

hatiye hundurê konê aliyê malê û kêmasiyên qawexanê dixwaze.

Perîşanê

pêdawîstiyên qawexanê dane Neimetî. Neimet çû dîwanxanê û ewan

dîsan zivirîn ber pesêva koni. Perîşanê ji Macanê pirsî:

— Kînga em dikarin herin bindarûkê?

— Hema sibê.

— Erê hema sibê karê me bike û emê tev herin serê riya wan. Lê Xudê

dilê min pîs dikute. Ez pir ditirsim.

— Na herê, ji ber şabûnaye. Ezê hema niha herim û bêjim dayîka Eyşan. Bila destûra me bide, em sibê herin bindarûkê.

— A, hema niha here bêjê, kanê çî dibêje?

Macanê bi şîrînî ji Eyşanê ra digot, dayîka Eyşê. Macanê xwe li aliyê malê bi Eyşanê ra gîhand û xwe li ber qelizand û gotê:

— Dayîka Eyşê, lê tu qet îsal me naşînî bindarûkê. Van rojana dilê min

wisan tijî bûye.

— Lawo kînga dilê we dixwaze herin. Perîşan jî hema van rojana gelekî

li ber xwe ketiye. Tifalê hind li jêr siya konî da maye, zer û zerhimî bûye.

Reng li rûçikê wê da nema ye. Bila, her kînga dilê we dixwaze tev destê

girêdin û herin ji xwe ra bigerin.

— Eger destûra te hebe, em dixwazin hema sibê herin.

— Başê lawo, herin karê xwe bikin û bêjin heval û hogirên xwe jî û sibê

tev herin ji xwe ra geriyanê.

— Ez destên te radimûsim, dayîka Eyşê.

— De herin karê xwe bikin. Lê lawo gelekî dûr neçin ha!

— Saya serê Axayî, kî dikare çep li me binêre.

— Na, na lawo hûn mêjve ji malê derneketine. Hûnê xam bibin, lew ra ez dibêjim dûr neçin.

— Başê, dadê. Zor sipas. Ez destên te radimûsim.

Macan bi gulşayî çû bal Perîşanê û gotê:

— Dadê destûra me da. Karê xwe bike, emê sibê herin bindarûkê.

Perîşanê li ber şabûna dil hebû fir bida. Li êvarê da karê xwe kirin.

194 BILÎCAN

Heval û hogirên xwe pê hesandin. Perîşanê nizanî li ber şabûna çi dike û

çi nake. He, rastî kê dihat, pê ra dikeniya.

Roj kuta bû û tav qulubî. Herdu suwarên gorînê hatin. Dîsan birûska du çavan li ser cotek çavên reşbelek da spêne kir. Dîsan agir berbû cotek

dilên pak û alavên evînê dîsan du leş li nav xwe da werpêçan.

Şev dakete erdê. Cîhan reş û tarî bû. Hemûyan şîv xwarin. Lê şîv li

gewriya Perîşanê da neçû. Bû dema razanê. Hemû razan. Bû hoke hoka

nobedaran. Lê xew li çavên Perîşanê nediket. Perîşan ketibû nav nivînan.

Lê nivîn lê bibû gurê har. Kêç ketibûn kurkê wê. Neditebitî. Li nav nivî-

nan derdiket û diçû ber derê xîveta xwe û li esmanî dinihêrî. Istêrên es-

manî lelepî bibûn û hevdu himêz kiribûn. Çavên xwe li hevdu diniqandin. Car caran jî stêrek ji nav koma istêrên ko hevdu himêz kiribûn, dirijiya. Bi rijiyana stêran ra lertzê dilê Perîşanê digirt. Dizivirî û

dîsan dihat û dikete nav nivînan. Lê pê wereng bû, ko hê taze seretaya

şevê ye. Şevê lenger avîtibû erdê û nediçû.

— Ay xudêyo çi şeveke dirêj û gêje. Tu dibêjî qay, qet naxwaze ji cî bile-

qe.

Dîsan ji nav nivînan derdiket û diçû ber derê xîveta xwe. Macan jî di-

hat û li rex disekinî. Ji Macanê dipirsî:

— Lê ev şeva qet ji cî nalive. Lê kengê sibêde yê bê?

— Bêhna xwe fire bike! Hê nivê şevê ye. A, ewa han, ewa hane sorşeş,

ew stêra karwankuj e. Hê ji sibêde ra gelek maye. Were razê tu yê sibê li

çolê xew ra herî ha! Were bikeve nav nivînen xwe!

Bi gotina Macanê ra dihat û dikete nav nivînan, lê dîsan hê ciyê xwe

germ nekirî, li nav nivînan derdiket û diçû ber derê xîvetê. Lingekî wê li

derva bû û yek li hundur. Piştî çendik û çend caran ko çû derva û hate

hundurî, Macanê gotê:

»A, ewa hanê, ewa ko taze li ber girê serê riya nêçîrgehê ra derdikeve, a,

ewa hane geş, ew stêra sibêdê ye. Istêra sibêdê waye ser dide. Ji sibêdê ra

êdî hindik maye.

Bi vê gotina Macanê ra Perîşan êdî nekete nav nivînan. Cil û bergên xwe yê taybetî bindarûkê li xwe kir. Xwe bi ser û ber xemiland.

Macanê

jî karê maşikanê kir. Kasik û kodik û dîzik û kefçik û giştî karên maşikanê

kirin têrxurcekê û li hêstirekê kirin û li nav konan derketin. Taze berê

sibêdê gewr dibû, ko koma qîz û bûkan li girê pêşberî malan ra diqulibîn.

Perîşan û Macanê heval û hogirên xwe pê hesandibûn ko diçin bindarûkê. Hevalên wan jî hevalên xwe pê agadar kiribûn. Ca her

195

BILÎCAN

hevalekê jî çendîn hevalên dî hebûn. Bi rê ketina Perîşan û Macanê ra bi

sedan qîz û bûk ji konan derketin û dane dû wan. Taze Perîşan û Macan



li girê pêşberî malan da diqulibîn, ko cotek siwar li wan fitilîn. Bû  
fîrefîra  
cotek hesp û li ber wan ra derbas bûn. Bi bihîstina dengê simê  
hespan ra,  
bi dîtina hespan ra, Perîşan hema li cî da çik rawesta û li Siwaran  
nihêrî.  
Dîsan ew berqa caranî li nîveka çar çav û du dilan ra hate  
veguhêstinê.  
Dîsan pirûska çar çavan, lerizîna du dilan, tevizîna du leşan, gêj bûna  
du  
seriyan, wekî bayê bezê li ser wan ra derbas bû. her di gel  
lêkghostina  
aviran ra Kerr û Kuliki zengî li Nijdî û Sosikê dan û bi taw li ber wan  
ra  
derbas bûn. Koma qîz û bûkan li dû Perîşan û Macanê ra tev hejikîn  
û  
dane dû herdu Siwaran. Lê êdî ji toz û dûmana li ber simên hespan  
pêve,  
çi şûnewar ji Siwaran nedihate xûyanê. Êdî cotê Siwaran li ber çavên  
wan  
wenda bibûn.  
Qîz û bûkan rêka xwe domandin. Nîvro ra hindik mabû, ko xwe bi  
kaniya Rihanê ra gîhandin. Pese û pûse, kevçî û kodik û dîzik û kûzik  
bar  
û barxanên xwe li rex kaniya Rihanê danîne erdê. kanî bînanî  
neynûkekê  
diçilvilî û aveke zelal li ber dikişiya û ber jêr diçû û li nava gul û  
sosinan

da wenda dibû. Libên xîzê li binê kaniyê da li ber tava danê berî  
nîvro

wekî mircan û mirwariyan diteyîsîn. Tavê zeliqandibûyê. Hulmeke  
sivik

ji gul û gîha û kanî û cok û cobaran, ji mêrg û çîmen û dar û devenan  
ber

bi hewa quloz dibû. Hulmeke nazik û tenik, ko bi zorê dihate  
xûyanê. Ev

hulma dûrva wekî xumamekê dihate xûyanê. Dûr va li binê deştê da  
dibû

leylaneke şîn.

Qîz û bûk birbirî bûn. Hindik li ser kaniyê man û dest bi karê kuçik  
danîn û maşikanê û firavînê kirin. Hindik jî li nav mêrg û çîmenan da  
bi-

jiqîn. Yên ko gul û sosin diçirpandin. Yên ko pincar diçinîn. Yên ko  
pêgermok lêdidan. Her yek xerîkî tiştekekê bûn.

Besta biniya kaniyê, dorandorî ava wê, ta çavan qeter dikir,  
masosinan

mil kutabûn hev û ber va diçûn.

Mamsosin guleke zor ciwan û bêhinxoş e.

Mamsosin tim li cîhên avzê û terazin li rex kanî û cobarên sivik  
diruskin. Li seretaya buharê da pêş da çend pelgên wê yên kesk li  
bin axa

ter û girane terazinan da derdikevin. Pelgên wê her li ser rîşa wê da,  
bi

erdê va dimînin. Hevraz naçin. Li dû ra nîveka wan pelgana navnêrî  
dide.

Pelg li erdê dimînin û navnêrî ko heman bistikê gulêye bilind dibe.

Bistikên masosinê lap yê bilin û dirêj bi zorê bihostek û çar tiliyan bilind

dibin. Bistikên wê rût û bêy pelgin. Rengê bistikên mamsosinê regekî

196 BILÎCAN

zerî zêrîne. Tu dibêjî qay bistikên wê ji zêrê xurû hatiye darêştinê.

Bistikên kizir û qirpok û birqonekî. Tenê her bistikek wê li ser çend pel-

gên kesk diruskin û hevraz diçin. Bi serê her bistikek mamsosinê va guşiyek gulên şîn, diruskin. Gulên hûrik û pêncperkî. Rengê van gulên

hûrik hişnekî esmaniye. Lê ne esmaniyekî vekirî, belkû esmaniyekî tûte.

Esmaniyekî pîrozeyî. Reng difire nav çavên mirovi. Nav pêncperkên van

gulên şîn da, ew ciyên ko paşê porik didin û tov digirin, qîçike. Qîçikekî

teyîsok. Durust li rengê tava demsala havînê ya danê nîvro daye. Tu dibêjî li nava her guşiyeke mamsosinê da çendîn tav bi dest danîne.

Rengê zer û şîn tevî hev dibin. Rengê esman û tavê. Lê tiştê ko taybet-

mendiyeke sera û seratiyeke taybetî daye gula mamsosinê, bêhna wê ye.

Bêhna wê weke bêhna sorgulê ye, lê bêhna sorgulê tunde, mirov zû ji

bêhna sorgulê têr dibe. Lê hindî mirov mamsosinê bêhin dike, hind diçe

dilê mirovî dixwaze ko mirov careke dî jî ewê bide ber bêfila xwe û  
pir bi  
dil sebeda sîngê xwe ji bêhna wê ya sivik û dilveker û canhebîn  
dagre.  
Bêhna wê ne bêhneke hind tunde, ko li mirovî bide, ne jî bêhneke  
re-  
voke. Bêhna wê bêhneke sivik û dilveker û berdewame. Eger mirov  
çepikek ji gula mamsosinê biçine û bi dîwarê oda xwe va darda bike,  
ta  
meheke xişt ew bêhna wê ya sivik û dilveker ji oda mirovî  
dernakeve.  
Hezaran gulavên bi nav û deng bila bi qurbanî tek gulbergekek  
mamsosinê  
bin. Koçer û gundiyeên terşdar, gulên mamsosinê berî wê hindê ko  
porik  
bidin, diçinin û gulbergên wê her wisan tereter tevî giviyên penîri  
dikin.  
Di gel penîri digivêşin û di dilê serkepenîran da cî dikin.  
Serkepenîran  
yan dikin nav xoşoravê, yan jî rûyê wan jajî dikin û wana dikin nav  
iyar  
û pêstikan da. Yan jî dikin kûpikan û ji danê zivistanê ra çal dikin. Îca  
zivistanê gava ko van serkepenîrana hûr dikin, gulbergên  
mamsosinê yên  
şîn hema wisan li ser reng û bêhna xwe li nav qetên penîri da  
derdikevin.  
Mamsosin bêhna xwe dide penîri û penîrê mamsosinê dibe penîrekî  
dî.

Sifra ko penîrê mamsosinê li ser be, dibe sifreyeke gulavîn û bêhnxoş.

Macanê li rex ava kaniya Rihanê çepikek mamsosin çinî. Qemtiyek pil-

tan û çepikek rihan jî da ber û pê giyareşeyekî ewan tev girêda û kire

qemtî û li ber kofiya Perîşanê ra kir û qemtiyek jî li ber girdêla serê xwe

da daçikand. Ê milê xwe li milê Perîşanê da û ew ber bi girê piştê kaniyê

tek kir û gotê:

»Ewan niha yan li binê geliyê pezkûviyan da nin, yan jî niha li besta Xwalîşorkê da xerîkî nêçîrê ne. Ca were em li ser vî girî bikevin û binêrin

kanê gelo emê bikaribin wana bibînin, yan na.«

197

BILÎCAN

Li ser girikî ketin. Piştê girikî besteke vekirî hindî çavan qeter dikir, ber

vedabû. Deşteke rip û rast. Ji vê bestê ra besta Xwalîşorkê digotin.

Xweliya vê bestê xweliyê kewrek û beyar bû. Hindî mirov berjêr diçû

xwalî kewrek û kewrektir dibû. Gava ko nermebaranek bibariya, best tev

da dibû herî. Lê hema du roj li ser ra derbas biba, bi bêhna bayê bilûrê ra

toz û dûman li ser bestê diket. Havîn û zivistan ew besta rût bû.  
Tenê  
qolqolî ew jî gelekî tenik û sêrek û dûrî hev devdîş û barevînk li wê  
bestê  
da hêşîn dibûn. Devdîş stirîneke gewrik e. Bilindaya her quleke  
devdîşê  
hindêk ciyan da digîje gezekî. Xezal û pezkûvî li ber siya van  
devdîşan da  
dizên. Berx û karên wan li ber siya wan devdîşana da mexel tên.  
Barevîn  
jî cureyek Kerrkorka bestan e. her li rengê Kerrkorkê da ye, lê şaxên  
wê ji  
şaxên Kerrkorkê teniktir û sêrektir û ziravtir in. Li duwemîn meha  
buharê da barevînk bejin vedide. Rengê barevînkê keskekî tût û  
xizik e.  
Bêhna wê zor tund û pîs e. Weke bêhna dermanê kêça ye. Lê bêhna  
barevînkê ji bêhna Kerrkorkê tiştekekê siviktir e. Dibêjin hesp û Kerr û  
hê-  
stir Kerrkork û barevînkê naxon. Eger zor birsî bimînîn û bi neçarî  
bixon  
jî, herdu çavên wan kor dibin. Lew ra navê vî gîhayî kirine Kerrkork.  
Lê  
kar û weceke vî gîhayî ya zor giring jî heye. Dibêjin mar û cir û  
canew-  
erên jehrîn ji vî gîhayî direvin. Diqewime her li ber vê hindê be, ko  
pezkûvî û xezal li ber siya vî gîhayî da dizên û biçûkên xwe li dema  
virnîtiyê da li ber siya wan radigirin, ko li hêrişên wan canewerên  
jehirdar

biparêzin. Li seretaya havînê da bere bere rengê barevînkê gewir  
dibe, ta  
ko li seretaya duwemîn meha havînê da hişk dibe û ew rengê wê yê  
kesk  
dibe regekî sipîçîl. Şaxên wê hişk û rîşala wê sist û pilposekî dibe.  
Ca  
hînga eger bayek, her nermebayek jî rabe, barevînk ji rîşal va ji erdê  
derdikeve û di gel bayê hevraz û berjêr dibe.  
Perîşan û Macan li ser girikî rûniştin. Çavên xwe li deştê gerandin. Ji  
bilî tûmên barevînk û devdîşan çî tişt li bestê da nedihate xûyanê.  
Li aliyê  
çepê xilxilan mil kutabûn hev. Mirovî ko weha li xilxilan dinihêrî,  
mirovî  
digot qay xilxile suwareleşkereke ko li raserî deştê mil kutane hev û  
cêrge  
girtine û çavnihêrî fermana fermanderê xwe ne, ko hêrişê bidin ser  
deştê.  
Ji van xilxilana ra banzda kûviyan digotin. Li bintara wan xilxilana da  
jî  
rêzek xilxilên dî dest pê dibû. Ev xilxilana ji yên dî kinktir bûn. Ji van  
xilx-  
ilana ra jî rizdê reş digotin. Perîşan û Macanê li deştê da çî tişt  
nedîtin.  
Çavên xwe li ser deştê rakirin û li nav xilxilan gerandin. Li nav xilxilan  
da  
jî çî tişt li ber çavên wan neket. Destên xwe ji çavên xwe ra kirin  
sîvank û

li binê deştê nihêrîn. Li binê deştê ew cîhê ko bizerê bi wan va  
dihate

198 BILÎCAN

xûyanê, lemelema leylanê bû. Li bintara xweliya kewrek, hemmanê  
tozek

nerm bînanî dûkela qelûnekê dihate xûyanê. Paşê ew toza zirav ber  
bi

xilxilan kişiya. Bû wekî qeytanekê. Qeytaneke gewre zirav.  
Qeytaneke

dûkelkî. Dûkela ko gewrîva dihingavt. Li bintara rizdê reş da ew  
dûkela

gewir bû du çiqan. Çiqek ber bi milê rastê bilind bû û çiqa dî ber bi  
milê

çepê çû. Herdu çiqan dor lêdan. Gurover bûn. Lev zivirîn. Dîsan  
bûne

çiqekê. Dîsan jêk cuda bûn. Du çiqên tozê bûne sê çiqan. Çiqa pêşiyê  
tozek nerm û zirav bû. Lê herdu çiqên li dû ra stûrtir bûn. Nişkava  
çiqa

pêşîn rawesta. Lev aliya. Li cî da bilind bû, bû xaleke gewir û paşê  
temirî.

Li dû ra herdu çiqên dî pê ra gihîştin. Herdu çiq tevî hevdu bûn.

Rawestan. Toz rabû hewa. Li hewale ewrekî kûşke serast kir. Paşê  
lev bela

bû. Li dû ra dîsan du çiqên tozê, lê vê carê du çiqên nermik û sivik  
hêdî

hêdî li ser wan da zivirîn. Hêdî hêdî karîn du reşan li jêr wê toza zirav  
da



bibînin.. Herdu reş jî durust ber bi wan dihatin. Durust li tanga wan da

pêş da dihatin. Reş bere bere mezin û mezintir bûn û bûn du Siwaran.

Macanê gote Perîşanê:

- Perîşan ewan bixwe ne.
- Erê ewin.
- Waye her rast li ser me da tîn.
- Erê her yekê waye nêçîrek jî li terkiya wan va ye.
- Erê nêçîra wan îro baş e.

Perîşan kenîya û bi yarî tepek li Macanê da. Herdu pêkve kenîyan.

Perîşanê got:

- De kanê nêçîrvanên çawanin?

Macanê got:

- Ca ka kes me nabîne?
- Çima ?
- Ezê neynûkê bavêjime wan.
- Kiçê şerm e.
- Na de şerma çi.
- De wisan bike, bila kes me nebîne, ha.
- Na, na. Çi kes me nabîne, lê.

Macanê xwe da ber pesêva Perîşanê û neynûk avîte wan cotê Siwaran.

Rewneqa neynûkê tevî rewneqa zêrên li ber eniya kever bûn û di gel

tirîşkên tavê dane nav çavên Kerr û Kuliki. Kerrî dizgîna Sosikê hilkişand

û li cî da rawesta û bi destê çepê dizgîna Sosikê ra girt û destê xwe  
yê rastê

jî ji çavên xwe ra kire sîvank û li girikê nihêrî. Seranserî girikê li gul û  
199

BILÎCAN

çîçekan da hatibûn vepoşînê. Lê du gulên ji rengê gulan, du gulên ji  
gu-

lan bedewtir û mezintir jî li nav gulan da rûniştibûn. Du sorgulên  
bijar e.

Kerrî Perîşan û Macan nasî. Berê xwe li ser Kuliki da kir û gotê:

— Hero Kulik eva Perîşane hatiye bindarûkê.

— Bi me çî bila ji xwe ra bigerin.

Ker û Kulik ketin axiftinê. Perîşanê dîna xwe dayê ko du, sê kiçkên  
dî

jî li ser girikê ketin û berbirî wan hatin. Yek ji wan jî kiçmeta wê  
Ciwan

bû. Ne ji gav da tişteke bînanî tirsê li dilê Perîşanê ra derbas bû. Berê  
xwe

li ser Macanê da kir û gotê:

— Macan! Ciwan jî waye hat.

Vêca bi hatina wan kiçikane ra herduyan xwe li çirpandina gul û  
çîçekan da mijûl kirin. Gava ko ew kiçikana hatin û gihîştin wan,  
Macanê ji Ciwanê pirsî:

— Herê firavîn amade nebûye?

— Xudê ez nizanim.

— Lê tu nizanî û ez nizanim, be kê bide av û nanim?

Herduk tev kenyan. Macanê bi milê wê ra girt û gotê:

— Xudê tu yê bêy û emê pêkve firavînê amade bikin. Perîşan dibêje destpêja kiçmeta min pir xweş e. De were em herin kanê destpêja te

çawaye?

Herduk bi ken û yarî ji yên dî veqetiyên û ber bi kaniyê çûn. Perîşan bi

çend kiçikên dî va li serê giriki man. Kiçên ko mirovî dikarî piştta xwe bi

wan va girê bida. Kerrî dîsan destê xwe da ber çavên xwe. Herdukan lap

baş hevdu didîtin. Dîsan ew birûska caranî hat û li nawenda du dilan da

rûnişt û du leş kelijand û du ser ji hiş û hendîşeyan vala kirin. Keri gote

Kuliki:

— Rabe em li ser wan da herin.

— Na, ji nav û dengê me ra baş nîne, Kerro.

— Kuro karê kê bi me ketiye?

— Çawa karê kê bi me ketiye. Niha wira tijî qîz û bûkin. Yê nebêjin, hûn li vira çi dikin!

— De ka em hema bi berhaneya avê herin ser kaniyê.

— Na ewna waye li ser kaniyê danîne. Ma tu dûkela kuçikê wan nabînî? Ji boy avê be, emê herin a, li ser wê coka hanê danên. Ew jî hema

ava wê kaniyê ye. Eger tu herî ser kaniyê, yê sibê li nava êlê da bibe dengî,

ko herdu kurên Silêmanî li ser kaniya Rihanê têkeliya qîz û bûkan kirine.

Vêca hînga emê bêaverû bibin. Emê bibin du polikên qelp. Were em  
her

## 200 BILÎCAN

li ser vê cokê kuçikê xwe danên û çend kebaban bipijînin û bixon û  
a, li

rêka hanê ra jî herin malê.

Keri bi neçarî pejirand û got:

— De çî nake, bila bi ya te be.

Hema li ser dîwarê cokê li hespan peya bûn. Nêçîrên xwe li terkiyên  
hespan vekirin. Hespên xwe qeyd kirin û rastî nav çayîr û çîmenan  
kirin

û bixwe jî xerîkê karê kuçikê bûn.

Perîşan jî hê li serê girikê li nava gul û çîçekan da, di gel du, sê kiçikan  
rûniştî ye. Agirê evînê daye dil û cergên wê. Waye tiştêkê bînanî  
lawu-

jeyan li ber lêvên xwe da dibêje. Perikên difina wê dilerizin. Deng  
hêdî

hêdî bilind û bilindtir bû. Bû weke vizeviza mozan. Paşê hêdî hêdî  
deng

rabû. Aza bû. Li qefesa sîngan derket. Li zîndana gewriyê rizgar bû.

Deng

kete çil û çîyan. Bînanî dengê zengilekê çîngiya. Weke dengê du  
çengan

teqil û aheng girt û bû lawuje:

De lolo cano, cano, cano, cano, cano...

Te lawiko nêçîrvano...

Dilhebîno, dilovano...

Şûrweşîno, palewano...  
Bejinbilindo, navmilpano...  
Te ronahiya van çavano...  
Ji min ra qend û şekir, ji xelkê ra kul û keser êş û jano...  
Evîna te yê dilê min evdala Xudê kirî kul û tev kovano...  
De lawiko eger tu hez dikî şevêkê ji min ra bibe tu mêvano...  
Mêvano, mêvano, nêçîrvano, serêm gorî dil heyrano.....  
Dengê wê ew naveya li nîveka girik û cokê da pîva û li nav mejiyê  
Kerrî  
da deng veda. Çingîn bi mejiyê Kerrî ket. Êdî felekê jî nikarîbû,  
pêşiya  
Kerrî bigirta. Li ser cokê rabû. Xwe bi wî berê ko li fêza cokê bû, ra  
gî-  
hand. Li ser berî rûnişt û destê xwe da peleguha xwe û qîrandê:  
Delê lê canê, canê , canê, canê ,canê...  
Wez heyranê Perîşanê...  
Bi nav û bi nîşanê...  
Heyva di çardanê...  
Hûrî û periya asîmanê...  
Çavbelekê çavciwanê...

201

BILÎCAN

Gulîzerê gulnîşanê...  
Birûreşê, wek qetranê...  
Enîberê wek meydanê...  
Sûret sêva li dukanê...  
Sîng keviya di zozanê...

Memik xirê wek fîncanê...  
Navziravê wek rihanê...  
Bejinbilindê wek fîdanê...  
Ji min ra şîrînê wek şerbeta li îskanê...  
Her gava ko tu hez bikî, wezê ji sîng û berên te ra bibim mêvan na  
xudê  
mêvanê paşîvanê,  
Lê lê canê, canê canê...  
Bi dengê Kerrî ra dilê Perîşanê li nav da herifî. Dilê wê lerizî. Cergê  
wê şe-  
witî. Agir berbibû dil û hinavên wê. Ji berê bilind û Kerrê ko li ser  
rûniştiye pêve, çi tişteke dî li ber çavan ra nedihate xûyanê. Te digot  
qay  
kulekên çavên wê li her alî da xitimandine. Her tenê ew berê bilind  
didît  
û Kerrê ko li ser rûniştibû û diqîrandê. Dilê wê hilkeliya û dîsan dest  
pê  
kir:  
Lawiko heyran îşev şev e, şev leylanî...  
Tu yê ji sîng û berên min ra hem mêvan î, hem xudan î...  
Tu yê bêy li ber derê mala babê min dêranê, bi ramiyarî û bi rêzanî...  
Wezê li ber te vekem cotek memkên di fîncanî  
Heger nobedaran pirsî ew kî ye, wezê bêjim ma hûn korin lawikê  
min  
e hatiye bi mêvanî...  
Hê dengê perîşanê kuta nebibû, ko Kerr li ser kevirî jorda daket û  
ber bi

Sosikê çû. Qeyd û bendên wê vekir. Lê siwar bû û hate raserî serê  
Kuliki

ra rawesta û bi dengekî ko rehên evîna tevî hêrsê tê ra diyar dikirin,  
gote

Kuliki:

— Zû dil û hinavan bide!

— Tu yê çî ji dil û hinavan bikî?

— Ezê bibim, bila Perîşan vê navrojê ji xwe ra biqelîne.

— Kuro avirûya me nebe, sibê Emer Axa yê pê bihese. Nebaşiyê çê  
be.

— Gelekî neaxive! Zû dil û hinavan bide! Taze dengê me belawî  
cîhanê

202 BILÎCAN

bû. Hezar kesî dengên me bihîstin. her Emer Axa niha pê hesiya ye  
jî.

Rûmetê Kerrî sorpiliqî bibû. Xwînê xwe dabû dora çavên wî. Perikên  
difina wî direqisîn. Kuliki dîna xwe dayê neherê birayê wî li ser  
hemdê

xwe nîne û nikare berayîka wî bigire. Dil û hinavên herdu nêçîran  
deranî

û hema wisan bi xwînê va da destên wî. Kerrî xwe xwar kir û bi lez  
dil û

hinav ji destên Kuliki vegirt û zengî li Sosikê da. Sosik bû ba û birûsk.  
Bi

bayê bezê ra xwe bi kaniya Rihanê ra gîhand. Li ser kaniyê giheşte  
koma

qîz û bûkan. Koma qîz û bûkan ji ber wî va rabûn û pişta xwe danê.  
Kerrî

dil û hinav raberî Perîşanê girt û gotê:

— Hanê eva jî maşikanêya we!

— Fermo, firavîna me amade ye!

— Na, zor sipas!

Birûska caranî dîsan du dil kelijand.

Êdî herduyan jî nikarîn xeber bidana. Kerrî dizgîna Sosikê zivirand û  
bi

gotin û lîlandina vê stiranê, li ber çavên koma qîz û bûkan bezir bû:  
Te keçika Mîrê milî, te keçika Mîrê milî...

Tu yê ji min evdalê Xudê ra hem sosên î, hem jî gul î...

Te yê vê sibêdê xwe daye li ser kanîka li serê milî...

Tu yê li nava mêrg û çîmenan weke gulê dinitilî...

Dengê te canikê li mejiyê hestikê min da kar kir, na Xudê li ser  
giyanê

min fitilî...

Tu yê ji min nêçîrvanî ra şewqa jînê, hewasa manê, na Xudê evîna li  
ber

vî dilî...

Xeber û axiftinên te yê ji min ra dermanê derdê dilan, na bi Yezdan  
kem avêşa hemû kulî

Ezê ji bejn û bala te ra evîndar im dinalim, dikalim, wek bilbilî...

Wek bilbilî, wek bilibilî...

Evê benda kutayê li nav serê Perîşanê da dikire zingîn:

Wek bilbilî, wek bilibilî... Rengê Perîşanê soromoro bibû. Serê wê  
kete

ber da. Qîz û bûkan di gavekê da dil û hinavên nêçîran sor kirin û ji



destên hevdu revandin. Ciwan, kiçmeta wê ji hemûyan zêdetir  
ketibû

peyê pirs û pirsiyaran. Di gavekê da ev xeberane li ser zarên qîz û  
bûkan

da belav bûn:

— Ji leşên du nêçîran çima hema dil û hinav tenê anîbû?

— Erê, ew jî dil û hinavên konkoni.

203

BILÎCAN

— Dil û hinavên kerkerî.

— Dil û hinavên peritî.

— Dil û hinavên xwînavî.

— Ew jî nîşaneke ha.

— Wate te dilê min peritandiye.

— Te kezeba min hincîhincî kiriye.

— Dilê min li evîna te da bûye gola xwîne.

— Xudê Emer Axa Perîşanê nade wî.

Her yekê li wê bareyê da xeberek digotin. Taze roj dageriyabû, ko  
ko-

ma qîz û bûkan bi gotin û axiftin û yarî û henek ji ser kaniyê ber bi  
zomê

li rê ketin. Perîşanê lavayî ji hemûyan kir, ko raza wê veşartî bihêlin.

Hemûyê erêkirin dane Perîşanê, ko li wê barê da çî tişt ji devê kesî  
ra

dernekeve.

Berî êvarê bû, ko koma qîz û bûkan mandî û şeqî giheştin zomê û  
bî-

nanî keriyekî karxezalan belawî nava zomê bûn û her kes çûne malên

xwe. Li dû wan ra Ker û Kulik jî bi cotên nêçîran va li girê pêşberî malan

da jor da hatin. Dîsan weke her car cendek çû ber derê mala Emer Axayî.

Her ro Kulikî cendek dibir. Lê vê carê Kerrî cendekê nêçîrê bir û li ber

derê konê navmalê danî û li pişta konî da fitilî. Macan li ber ra derbas bû

û hêdîka li ber lêva xwe da gotê:

»Îşev were mala me! Perîşan jî tê.«

Vêca bi tiliya xwe çatorê dayîka xwe nîşanî Kerrî da û li ber konî ra du-

ta bû.

204 BILÎCAN

26

Hewa ewrayî bû. Şevê çarşeveke reş kişandibû ser êla Emer Axayî. Cîhan

wisan tarî bû, te digot qay her tiştên li ser rûyê vê cîhanê da heyî li qîra reş

ra kirine. Dar û ber, kevir û kuçik, çol û çîmen, der û deşt, çadir û xîvet,

kon û çator, keriyên pezî, xûlên hêştiran, revoyên hesp û hêstiran, garanên ga û mange û kel û gamêşan hemû, êl cînva li reşatî û bêdengiya

şevê da cûm bibûn. Çi tişt, li tariyê da li ber çavan nediket. Çira û  
momên  
malan yek li dû ya dî ra temirîn. Dengê rewterewta seqan vetexirî.  
Çi  
deng li ber guçikan nediket. Her tenê car û baran dengê zengilê  
stuyê ner  
û lok û nêriyan, yan pişkîna bizinekê bêdengiya şevê dişkandin.  
Berjengên baranê hêdî hêdî direşand. Giştî xelkê êla Emer Axayî raz-  
abûn. Tenê nobedarên zomê hişiyar mabûn û ji tirsê reşedizan  
hokeho-  
ka wan bû. Ker li nav nivînan da neditebitî. Lihêf û doşik lê bibûn  
gurên  
har. Lê bibûn şûjin û derzî. Serê xwe ji bin lihêfê ra derxist. Werdek  
xew  
ra çûbû. Mişîna xewa wê bû. Kulik jî mêjve bû, ko se biribû avê. Ker  
hêdîka li nav nivînan derket. Kincên xwe li tariyê da li xwe kir.  
Xencera  
xwe li ber xwe ra kir. Hêdîka teletel ji konî derket. Baran nermik  
nermik  
dibarî. Baraneke hind hûr û nerm dibarî, eger nemnema wê neba,  
ser û  
rûmetên mirovî ter nekira, mirovî nedizanî, ko baran dibare. Hêdî  
hêdî  
ji konî dûr ket. Fîrîna hespekê hat. Ker li cî da rawesta. Baş guhdarî  
kir.  
Sosik bû, çav dabû wî, difîriya. Teletel ber bi mala dapîra Macanê  
şiqitî.

Pêş da li tariyê da, çatorê dapîra Macanê nas nekir. Li nîveka du xîvetan

da rawesta. Li dilê xwe da got: kuro xwe şaş nekim û nekevim malê xelkê.

Îca yê sibê bêjin; kurê Silêmanî hatibû diziyê. Îca ezê li nav êlê da ruswa

bibim.

Çavên xwe kuskusand. Baş lê hûr bû. Çatorê dayîka Macanê li tariyê da

nas kir. Ber bi çatorî çû. Giheşte ber derê çatori. Derê çatorî vekir. Li

hundur çatorî da çi tişt nedihate xûyanê. Li ber derê çatorî bû, ko ne ji

gav da, li aliyê başûrê , durust li sûya pêşberî malan da, birûskê veda.

Birûskê wisan deng veda, ko erd û esman li ber hejikîn. Bi dengê birûskê

ra der û deşt, çil û çiya, kon û xîvet, hewş û extirmexane, êl cînva li ron-

205

BILÎCAN

ahiyeke sosret da cûm bûn. Li çavqirpandinekê da her der wekî rojê ron-

ahî bû, û hema di wê çavqirpandinê da dîsan jî cîhan li wê tarîtiya pêş da

cûm bû. Ker li ber wê ronahiyê karî hundurê çatorê dapîrê bibîne. Kete

hundurê çatorî. Macan hate pêşiyê û hêdîka, wisan hêdî ko Kerrî bi zorê

jê fam fikir, ji Kerrî pirsî:

— Tu hatî?

— Erê.

— Tu lêre be, ez herim Perîşanê pê bihesînim.

Macan ji çatorê xwe derket. Lemelem û teletel ber bi konê mala Emer

Axayî firikî. Hokehoka nobedaran bû. Nav li seqan didan û qestîka ji tir-

sa reşedizan dengê xwe bilind dikirin û bi hev ra xeber didan. Macan li

rex wan ra derbasî hundurê xîveta Perîşanê bû. Bi xîşêna wê ra Perîşan

rabû ser piyan. Perîşan hema wisan bi cilikan va ketibû nav nivînan. Ji

Macanê pirsî:

— Hatiye? Kesî tu nedîtî?

— Na, lê nobedar hişiyarin.

— Hêdî were! Çi nake.

— Huşşşş!

Her du li tariyê da bûne yekê. Eger li wê tarîtiyê da kesekî ew herdu bidîtana jî, yê we bizaniya ko her mirovek tenê ye. Eger bidîtana jî, Macanê dikarî bêpakî û serbest navê xwe bihaniya û bigota ez taze ji xîve-

ta Perîşanê tîm û ezê herim mala dapîra xwe.

Milên hevdu ra girtin, bi pêxişik ber bi derê çatorê dapîrê xişikîn.

Sebeta sîngên herduyan li tirsan da weke tufka asinkera radibû û  
rû-  
dinişt. Çi kesî ewan nedîtin. Tev daketin hundurê çatori. Bi têçûna  
wan  
ra Ker bi helkehelk hate pêşiya wan û tevî wan bû. Macanê ew her  
duk  
tenê hêla û derkete derva û çû kulînê lalayi dapîra xwe.

Perîşanê got:

- Ker!
- Perîşan!
- Tu hatî ez bi qurban!
- Erê ez bi gorî!
- Tu çima wisan dereng hatî?
- Kulik xew ra nediçû.
- Ez bi gorî Ker!
- Ez heyranê Perîşan!

Du leşan li tariyê da hevdu himêz kirin. Bû helkehelka wan. Du dil,  
dil

206 BILÎCAN

hebûn li rikeya sîngan derkevin. Du leş tev lerizîn. Lerza şabûnê. Du  
alav,  
du gurî, du pilotên agirî li ser du lêvan gihîştin hevdu. Du bizot têkelî  
hev  
bûn, gurî dan. Dest listuyên hev ra birin. Germaya leşên wan tevî  
hev  
bûn. Du guriyên agirî bûn guriyekê. Bûn pilotekê. Du tîhniyên  
dilşewutî

giheştibûn ser kaniyeke zelal û ronî; kaniyeke pak û tevizî. De niha hilneçine, lê kengê hilçine. Ramûsanana rê nedidane hev. Dev kiribûn nav devên hevdu û av li kaniya lêvan dimêtin. Alavek germ û sincirî ji leşên wan radibû. Tev ketin nav nivînan. Du leş bûne leşekî. Dest hêdî hêdî li gerdenê şiqitîn û ber bi sîng û beran dirêj bûn. Ber bi mil û navmilan çûn. Ker gêj bibû. Nizanî yê çî bike û çî neke. Ji ramûsanana têr nedibûn. Dest çû nav baxê sêvên suruştî. Du, sêvên kal. Du berên hişk. Du lîmoyên ter û gir û hulo. Serên lîmoyan taze bişkoj dabûn. Lîmo li nav destên Kerrî da hilnedihatin. Devê Kerrî li ser lêvên gêlasî berjêr şiqitî. Kete ser çenê. Xala çenê mêt. Dakete ser jêrçenê. Xewxewka weke şeftalûyekê kire devê xwe. Lê têr nebû. Berjêr dakete ser gerdenê. Gerdena blurîn bêhin kir, mêt û jorda şiqitî nav baxê sêv û hêvan. Li ber bêhina baxê hêvan xêv û mest û gêj bû. Perîşanê weke tuştûrekê xwe dabû ber sîngê wî; ji hevdu têr nedibûn. Perîşanê jî ramûsan li dû ramûsanana ji devê Kerrî hildida. Wekî du kotirên dilketî û evîndar dimkên xwe kirin nav dimkên hevdu. Leşê wan dikelijî. Xûyê li ser wan ra davît. Xûya leşên wan hişik dibû, û dîsan ser ji nû careke dî

xûyî diherikî. Xûya leşên wan weke cobareke herik têkelî hev dibûn  
û tev

li ser leşên wan da dişûlikîn. Hevdu tund himêz kiribûn. Ji hevdu têt  
nedibûn. Dîsan ramûsan dest pê bûn. Paşî demeke xurt bêhna ner-  
mexûyê da serê wan. Demeke xurt hema wisan bêdeng xerîkî  
hevdu bûn.

Bêdengiyeke sosret li ser wan da desthelatdarî dikir. Perîşanê ew  
bê-

dengiye şkand û got:

— Şev dereng e, min berde ez herim!

— Tu her taze hatî. Tu yê kî va biçî?

— Ez ditirsim!

— Ji kê!?

— Bavo yê bi me bihese.

— Ê, hesiya, hesiya. Dê çi lê bê?

— Na, şerm e!

— Şerma çi?! Tu ya min î ha!

— Erê, ez bimirim ya erdê me, bimînîm jî, ya te me.

— Ê, tu çi ra ditirsî?

207

BILÎCAN

— Bavo !

Êdî Perîşanê nikarî xebera xwe kuta bikira. Kerrî gotê:

— Ez çavên te yên belek bixom! Tu ji çi ditirsî!? Xoşdeviya min! Ezê  
bişînim xazginiyê te û te ji bavo bixwazim.

— Erê, ez bi gorî Kerr!

— Ez bi qurbanê Perîşan!



Hûrikhûrik ketin axiftinên şirîn. Hewa sar bibû. Şev tevizîbû.  
Hulmegulma leşên wan sar bû. Perîşanê xwe nediêşirand. Gote  
Kerrî:

- Em rabin!
- Hê zû ye lê!
- Na, derenge!
- Ka em taze bi hev ra diaxivin.
- Tu ko têr nabî!
- Nee, Yezdan kem salekî jî van lêvên gêlasî bimêjim, jê têr nabim.
- Baxê te bixwe ye.
- Zor sipas xoşewîsta min!

Perîşan dilerizî. Didanên wê li hev diketin. Kerrî ew da ber sîngê xwe  
û

li nav herdu milên xwe da givaşt û ramûsî û jê pirsî:

- Li te sar e?
- A, ez dilerizim. Min berde ez herim!
- Hê zû ye te çi leze?!
- Erê li te zû ye, li min dereng e.
- Erê rastî dengê te pir xweş bû. Dengê te bînanî du çengan lev diket.
- Dengê te jî. Rastî Ker tu dengbêjekî başî ha!
- Tu jî Perîşan!

Perîşanê xwe li nav destên wî derxist û gotê:

- De destûra min bide, ez herim!

Kerrî ne ji dil ew berda û gotê:

- Şevêk dî dîsan jî were ha!
- Baş e!

Dema ko serên Ker û Perîşanê germ bibû, Macan jî li tariyê da hatibû,

li ber serê wan li qunçikê çatori da lihêf li serê xwe alandibû, li bin lihêfê

ra dîna xwe dabû wan. Guçkên xwe li wan dagirtibû. Bi got û bêja Ker û

Perîşanê ra xwe kuxand û got:

— Sibe waye temîz dibe, hûnê kengê ji hevdu têr bin?

Bi dengê Macanê ra Perîşanê xwe tev pêça û xatirê xwe ji Kerrî xwest û

ew û Macan tev ji çatori derketin. Şingîna baranê bû. Kerrî li dû wan ra

208 BILÎCAN

serê xwe li qetê çatori ra deranî û li dû ra li Perîşan û Macanê nihêrî. Ewan

li nav baran û tarîtiyê da wenda bûn. Hê jî hokehoka nobedaran bû, kon

û xîvet li avê da mabûn. Li rişiyên dora çatorî ra av şurik dirijiya. Ji dengê

nobedaran û şurîna avê pêve çî dengên dî li ber guçikan nediketin.

Hêdîka ji çatorî derket. Li bin baranê da teletel, bi pêxişk ber bi xîveta

xwe çû. Li nêzîkiya xîvetê dengek li ber guçkên wî ket. Li dû ra bû şîhîna

Nijdî. Xişênêk jî li hundur xîvetê hat. Kerrî zanî li mala wan da pê

hesiyan e. Çû extirmexanê. Sosik û Nijdî û mahîna Barxane li avê da

mabûn. Te digot qay her sê hesp şoştine. Çû bi kuxtekuxt li nav cil  
û ci-

hazan da sê cilhespe deranî û bire extirmexanê. Her cilek li hespekî  
kir.

Teng û berên wan şidand û aza aza zivirî hundurê xîvetê. Dîna xwe  
dayê

Kulik waye lihêf avîtiye navmilê xwe û li nav ciyan da rûniştiye. Gava  
ko

Ker dakete hundurê xîvetê, Kulikî jê pirsî:

— Tu ko da çûbû? Te ez kuştim!

— Baraneke wisan dibore, tu dibêjî kûzkê derneqot kiriye. Hesp li  
ber

baranê mabûn. Ez çûm min her sêk cil kirin.

— Erêka!

Kerrî bersiv neda û hema wisan bi cilikan va xirpişî nava nivînan.  
Xewa

wî herimî bû. Xew li çavan nediket. Lê Kuliki lihêf kişande ser serê  
xwe û

dîsan xew ra çû. Kerr li nav nivînan da xwe vî alî wî alî difirikand.

Dîmena dîtî li ber çavên wî ra derbas dibû. Lê serê wî jî hêdî hêdî gêj  
bû.

Serê wî giran bû. Te digot qay topa cîhanê li dora serê wî ra  
digerînin.

Çavên wî guhan kirin. Hêdî hêdî çavên wî çûne ser hev û kêrûşka  
xewê

xwe di landa çavên wî da cî kir. Xurîn lê ket û xew ra çû.

Tava paşî baranê tijî cîhanê bibû, hê jî Ker li xewa şirîn da bû.

## BILÎCAN

27

Destkêşan ji hindek kar û kiriyaran pir dijware. Hindek kiriyar hene,  
ko  
hema carekê da ji mirovî ra dibin xû û xide. Wisan dibin xû û xide,  
ko çi  
hêz û şiyar neşên mirovî ji kirina wan kiriyarana dûr bêxe. Ew  
kiryaran  
a ji mirovî ra dibin akarên ji bîrnebûyî. Gava ko mirov bû xûgirtiyê  
tişteke, êdî pir dijwar e ko mirov bişê dest jê bikêşe. Yek ji wan  
kiryarên  
ko mirov ji mirinê ra jî neşê dest jê bikêşe, dîtina yar û evandina  
dildaran  
e. Çi hêz û şiyar, heylo hêzên sererayî suruştê jî nikarin evandina  
du  
layanî, evandina ko li binê du dilan da penc vedabe, ji nav bibe. Eger  
mirov carekê li ciyekê da dilhebînek dît û çend ramûsan li nîveka  
mirovî  
da hatin lêkguhostinê, êdî mirov bêy hemdê xwe hemû rojê di  
heman de-  
ma ko mirovî cara yekê ramûsan lêkguhostiye, tê wî ciyê gorînê.  
Mirov  
we dihizire ko ew kes her şev û roj li wê derê rawestayê û li bendî  
mirovî  
ye, ta ko dîsan, careke dî ewê kiriyarê ser ji nû zindî bike. Li destê  
mirovî  
bixwe da nîne. Mirovî pal didin. Li cîhaneka nediyar ra bangî mirovî

dikin û dibêjin: hoy dem ji deman bihorî. Yara te wa li bendî te ye.  
A, eger çar çav fêrî hevdînê, çar dest fêrî hevgivişînê, du dil fêrî hev  
hebînê bûn, êdî nikarin dest ji hevdu bikişînin.

Eger xortekî tazegiheştî û kiçeka xame fêrî hevdu bûn, bêhna hevdu  
hildan, çavên wan li nav çavên hevdu ket, destên wan giheşte  
destên hev,

dilên wan hevdu heband, evîna wan gul vedide. Evîn li nav dil û  
hinavên

wan da bînanî tûmekê tûr vedide. Reh û rîşalan li dil û hinavan da  
çik

dike û êdî çi tişt, çi kes, çi hêz nikare reh û rîşalên wê evînê , ewê  
evîna pa-

ka asimanî, evîna ko şûnewarê wê li seranserî leşên evîndaran da, li  
rêveçûn û axiftin û kenîn û girîn û rabûn û rûniştina wan da xwe bi  
eşk-

eretî dinivîne, ji dilên wan da derîne. Çi şiyar neşê reh û rîşala wê  
evînê

li binî va hilqetîne. Heylo merg û mirin jî nikare agirê ewê evînê  
bitemirîne. Evîndarên weha eger bimirin jî, li gorinê da, li cîhana  
nadiyar

da digîjin hev. Pirikên giyanên wan digîjin hevdu.

A, evîna Ker û Perîşanê jî ew evîna rasteqîne bû. Evîna asimanî bû.  
Ker

û Perîşan êdî fêrî hevdu bibûn. Dilên wan weke du baldarên evîndar  
210 BILÎCAN

penc kutabûn nav hevdu da. Ewan bîneyên hevdu li her tiştên ciwan  
da,

li avê da, li tavê da, li gul û çîçekan da, li xodîka dilan da, didîtin.  
Bejn û  
bala her duyan tim û tim li ber çavên yektir bûn. Ewan dengên  
hevdu li  
nalîna bilbilan, li kalîna şalûlan, li qûtîna qulingan li qîjîna eluhan, û  
li  
zarîna bazan da dibihîstin. Eger rojekê hevdu nedîtana, şet û şeyda  
dibûn. Êdî destên herduyan li hev ketibû. Bêhna wan têkelî hevdu  
bibû.  
Leşên wan giheştibûn hevdu. Xûya leşê wan tevî hev bibû, tev bibûn  
co-  
barekê û li nav hevdu da herikîbûn. Hulma bedena wan têkelî hevdu  
bibû. Êdî ev kiriyarana hemû fêrî hevdu bibûn. Şeva ko du xûyên  
wan  
tevî hev neba, destên wan negehîştta hevdu, ew şev êdî şeva wan  
nebû.  
Kerr û Perîşan bûne evîndarên hev. Ev gotina li ser zarên komelê  
ketibû. Rojê bi sedan kesî ev risteya dirîst û ev hevoka vedihûna.  
Ewan  
hejî hevdu dikin. Xoşina wan li hevdu tê.  
Van rojana hema li her kîderê du kesan pêkve biaxifta, bêygotin li  
bara  
wê evîn û evînbaziyê da diaxiftin. Li her alî piçepiça keçikan bû.  
Pistepista kurikan bû. Bilmebilma pîrejînan bû. Bolebola kalemêran  
bû.  
Gimegima gencan bû. Li wan rojan heval û hogiran, ewanê ko razên  
xwe  
yên sergirtî li bal hevdu servedikirin, ji hevdu ra weha digotin:

- Ker û Perîşan bûne evîndarên hev.
- Dilê Kerrî ketiye Perîşanê.
- Dilê Perîşanê jî ketiye Kerrî.
- Herdu jî hejî hevdu dikin.
- Hevdu evandine.
- A, du dil û çar çavan hevdu evandin e.
- Evîna weha asimanî ye.
- Dibêjin her şev hevdu dibînin.
- Li kîderê hevdu dibînin?
- Li mala dapîrê da hevdu dibînin.
- Li mala dapîra Macana Cano da hevdu dibînin.
- Kê dîtiye?
- Dibêjin nobedaran dîtiye.
- Nobedaran şev Ker nas kirine.
- Perîşan jî nas kirine.
- Çawa nobedaran nekirine dengî?
- Kuro nobedar newêrin li ser siya Kerrî bikevin.
- Erê nawêrin.
- Na, na newêrîna çi! Li ber Emer Axayî şerm dikin.

211

## BILÎCAN

- A, naxwazin kiça axayî biçinge.
- Erê yeka dî ba niha zû va servekiribû.
- Erê hema nobedar li ber du hegeran ewê hindê tepis dikin. Yek ji Kerrî ditirsin. Ya dî jî ji Emer Axayî şermê dikin.
- Kiçê li mala dapîrê da?

— Çi ciyekî baş dîtine.  
 — Dibêjin her şev li wêderê hevdu dibînin.  
 — A, ev demanekî xurt e ko Kulik tenê diçe nêçîrê.  
 — Dibêjin Ker bi şev xew li çavan nakeve, ta sibêdê digel Perîşanêye  
 û  
 bi roj jî radizê.  
 — Herduk jî bûne dilda yî!  
 — Erê derdên dilan bila kevir û kuçik nebîne.  
 — Kevir jî li ber derdên dilan diavin.  
 — Bila Xudê derdên dilan nîşanî dar û beran jî nede.  
 — De yezdan mirazên wan bi hevdu bike.  
 — Çi ? Xudê kem eger Emer Axa kiça xwe bide wî.  
 — Na, rast dibêje. Emer Axa yê çawa kiça xwe bide revîvanekî!  
 — Kiçê revîvanê çi?! Mêrik pehlewane. Nebiyê Eliyê Mîrî ye.  
 — A, a, rast dibêje, Ker kurê Silêmanê Eliyê Mîriye.  
 Her yekê li bara evîndariya Ker û Perîşanê da tiştê digotin. Ev goti-  
 nana hemû, ev xeberana gijik li ber guçkên Neimetê Îsi jî ket.  
 Neimetê  
 Îsi şabûna dil dikir fir bida. Şa dibû, ko raza wan tepis nebûye. Raza  
 wan  
 derketiye eşkeretiye. Şa dibû ko xelik hemû pê hesiyane. Lê her  
 gava ko  
 evîndariya wan dihanî pêş çavên xwe. Ramûsanên wan, evînbaziya  
 wan,  
 dest li gerdênbûna wan, bîneya wan herduyan dihanî ber çavên  
 xwe,  
 agirê çavnebariyê li dilê wî da gur dibû. Agirî li dilê wî da gurî digirt.  
 Pêtî



vedida û can û cendekê wî dişewitand. Li dilê xwe da, li cîhana xwe  
da  
xwe gelekî li ser Kerrî ra digirt û xwe ji xwe ra digot. Hema pêşiyên  
rast  
gotine ha: Gîhayê hewşê tale. Mirîşka xelkê qaze. Ez kurmetê wê  
me, lew  
ra keyfa wê bi min nayê. Devê xwe bi min xwar dike. Lê şev diçe  
dikeve  
paşela kurê jinebiyê da. Revîvanekî li ser min ra digire. Ez berdevkê  
bavê  
wê me. Hemû kar û barên dîwanxanê li destê min da ye. Ez xarzayê  
ax-  
ayekî bînanî Emer Axa me. Qet kes nizane ka Hesê Dûdê çi tebaye.  
Min  
napejirîne, diçe dilê wê dikeve revîvanê bavê wê da. Kuro hema rast  
dibêjin ha hişê jinê hişê qijalkê ye. Bilabe ezê niha wê evîndarî û  
evîn-  
baziya wan li pozê wan ra bînim. Ezê wê dilketinê li ber wan da  
bihêlim.  
Ca tu hê dîna xwe bidê, ka îca ez çi dînim serê wan. Ezê wê keyfa  
wan ya

212 BILÎCAN

şevane piçik piçik li difina wan ra derînim. Ezê bihîştta wan bikim  
dojeh.  
Ezê giştî wan henek û laqirdî û evîndariya we bikim êş û jan. Ezê  
şayiya  
we bikim şîn. Vîna we bikim kîn. Ca tu bihêle hê...

Danê piştî nîvro bû. Dîwanî kes li dîwanxanê da nemabûn. Tenê  
Heso  
Rîspî û çend qawegerîn li dîwanxanê da mabûn. Tava danê piştî  
nîvro  
zeliqandibûyê. Tavê li qelşê kon û celxê çîtan ra dabû ser kulavên  
sore  
xurestanî. Nava konî tîştîşî bi wê tavê hatibû nûrbaran kirinê. Li her  
celx-  
ekê ra qeytaneke zêrîne tavê dabû hundur. Te digot qay hindex  
hûrikên  
zêrî bi dest li ser kulavan reşandine. Ta tu li ser kulavan nerûniştay,  
te  
nedizanî ev qeytanan, tirîşkên tavên e.  
Emer Axa weke caran li ser dema xwe bû. Li ciyê xwe yê hemêşeyî,  
pala  
xwe dabû palgî û berpalkan û li ser doşeka mexmere gulavtûnkirî  
lemisîbû. Destê xwe yê çepê dabû binçena xwe û bi tipilên xwe yên  
destê  
rastê li ser çoka xwe miqamekî şad dijenî. Her dema ko keyfa wî saz  
ba,  
wisan dikir. Îro jî dema wî saz bû. Hay ji bayê felekê nibû. Te digot  
qay  
cîhan hemû ya wî ye. Hema wisan bû jî. Cîhana ko ewî nas dikir  
hemû jî  
her ya wî bû. Eşîrên heşt hozên mezin bi destiyariya dewleta  
nawendî  
ketibû jêr desthelatdariya wî; êlek giran li bin destê wî da bû. Hemû  
li xe-

berdaniya wî da bûn. Kesî tirsava, bêy gotina wî av jî nedixwar. Kes  
bêy  
ferman û destûra wî nediwêrî biçûya ser avê jî. Emer Axayî bigota  
bimire,  
bimire. Bijî, bijî. Li navê la heşt eşîran da kesî bêy destûra wî nedikarî  
kiça  
xwe bide mêr û ne jî dikarî kurê xwe bi jin bike. Debiya pêş da li bara  
wê  
doza giring da di gel axayî biaxifta, paşê ew yeka han bikira  
xeberdanî.  
Eger kur û kiçek bibana evîndarên hev jî, hejî hev bikirana, ji dil û  
can  
keyf bi hevdu bihata jî, erêkirin ji hevdu ra bidana jî, lê axayî  
nepejiran-  
da, ew yek çî caran nedibû. Eger axayî nepejiranda, ew kurik û  
kiçkên  
evîndar bi fermana axayî jêk cuda dibûn. Her yek bi zorê didane  
destên  
yekî nedîtî û neevandî. Ewan xazîka evîna xwe bi xwe ra dibirin gorê.  
Lê  
berewajî wê eger kur û kiçekê hejî hevdu nekirana, kerbên wan li  
hevdu  
bihata, lê axayî bigota erê, êdî kuta bibû. Ew herdukên dijî hev bi  
destên  
zorê û bi fermana axayî lêk mare dikirin û temenekî dûr û dirêj du  
kesên  
ko dijî hev bûn, ava wan li cowekê da nediçû, bi destên zorê li ser  
axurekî

girêdidan.

Li nav seranserî êlê da eger şayiyek heba, pêş da debiya ji axayî ra big-

otana, destûr ji axayî bixwastana, paşê karê şayiyê bikirana. Diviya pêş da

ew yeka digel axayî helêxistana û dîtina axayî bizanibana paşê ew yeka

bikirana xeberdan. Axayî bigota erê, erê, na, na. Kê dikarî bi xeberdaniya

213

BILÎCAN

axayî nekira!? Eger yekê li wê barê da her kûşkê pirçûkê xwe jî bikira, axa

yê ew li nav êlê raqetanda. Yê para berda wî, ew bê mal û war bikira. Ew

belengaz bikira. Her şayî û zemawenda ko biba li herdu layan, hem ji

mala babê zavayi, hem jî ji mala babê bûkê ji mala axayî ra nêrî û beranên

bijare dişandin. Îca niha karê felekê binêre. Ker û Perîşan bêy destûra ax-

ayî evîndarî û evînbaziyê dikan.

Neimet dîn û hêç bibû. Li dervayî dîwanxanê pêgermok digerand û nexşe dikişand. Gava ko zanî komel hemû ji dîwanxanê derketine û xalê

wî tenê maye, xulkê xwe şîn û kotî kir. Lêva xwe daxist. Pirçûkê xwe kir

û bi bîr û hizrên xêrnexwazane va dakete hundurê dîwanxanê. Gava ko

Neimetê Îsi dakete hundurê dîwanxanê, axayî li nava birû û bijangan da

lê mêze kir. Bi xulkê wî yê şîn ra zanî ko tişteke heye. Bi hejiyareya birûyan

jê pirsî:

— Çi heye xarzî?

Neimetî bi wî xulkê xwe yê kotî birûyên xwe lev asê kir û lêvên xwe wa-

jî kir. Wate ez çi zanim.

Emer Axa li ser xû û xideyên Neimetî ketibû. Zanî dîsan tişteke giring heye ko Neimet dixwaze jê ra bêje. Zanî dîsan Neimetî wêjareke giring li

ser kesekî jê ra amade kiriye. Zanî ko Neimetê xwarzî dîsan hatiye razeke

giring ji wî ra serveke.

Berê xwe li ser qawegerînan da kir û gote wan:

— Herin paqijiya qawexanê bikin!

Qawegerînan zanîn ko dîsan şêvreke wî û Neimeti heye. Li dû fermana

axayî ra li dîwanxanê derketin. Emer Axa û Neimet, xal û xwarzî tenê li

dîwanxanê da man. Neimet li ciyê xwe rabû. Li dora xwe nihêrî. Emer

Axayî gotê:

— Were kanê te çi bihîstiye?

Neimet çû li rex wî, li kêleka doşeka wî li ser çokan rûnişt. Serê xwe

xwar kir. Lê nekarî gotinên xwe bêje. Dîsan tirsetirs, bi hemet li dora xwe

nihêrî. Paşê bizerê karî bêje:

- Xalo Kerrî.
- Çi kiriye?
- Ez şerm dikim.
- Tu çima şerm dikî ? Gotinên xwe bêje!
- Xalo rûyê min li bin piyê te be! Kero...
- De bêje tu çima dimizimizînî?
- Xalo Kero û Perîşan...

214 BILÎCAN

Rengê axayî soromoro bû. Xûnê xwe da nav çavên axayî. Gepkên wî hêdî hêdî reng guhestî bûn û bînanî leteka xûnê sor bûn. Perikên difina

wî reqisîn. Bi tûreyî got:

- De bêje ka çî bûye!?
- Hejî hev dikin.
- Kê dibêje!?
- Hemû dibêjin. Hemûyan dîtine.
- Kî dibêje? Çî dîtine?
- Xalo hemûyan dîtine. Em rusva bûn.
- Te bixwe çî bihîstiyê ?
- Xalo Kero gelekî lingên xwe li guçkên xwe dixê. Zêdezêde diaxive. Gelekî ji xwe mezintir diaxive.
- Çî gotiyê?

Dengê axayî xitimî bû. Te digot qay fetisiye.

— Kero gotiye eger axa Perîşanê nede min, ezê birevînim. Ezê bi zora

darê dar rimê jê bistînim.

— Gotiye kê?

— Komel hemû dibêjin. Xalo ewan her şev hevdu dibînin.

— Hevdu dibînin?

Axa tûre bibû. Dengê wî bilind bibû. Rabû li ser çokan rûnişt û pirsî:

— Li kêderê ? Li kîjan cehnemderê da?

— Li mala dapîrê da.

— Kê dîtî ye?

— Nobedaran dîtine.

Axayî gazî kir: kuro kî li wê derê ye?

Çar dangan bi hev ra bersiv dan û gotin: belê ezbenî!

— Ca yek ji we were vira!

Derî vebû. Êxoyê File hate hundur û got:

— Fermo ezbenî!

— Here gazî Şemoyê bike!

— Baş e ezbenî.

Êxo bi gotina xwe ra ji dîwanxanê derket. Repetepa piyê wî li pişt dîwanxanê da wenda bû. Xal û xwarzî tenê man û dîsan bû pistepista

wan. Paşî demekê Şemo nobedar, dijxew, çav li serî da perçivî bi bawûşk

hate hundur û silav li axayî kir. Lê axayî bersiva silava wî neda û gotê were

vira rûnê. Êxo tu jî here ser karê xwe. Şemo li reng û rûçikê axayî nihêrî.

Agir li nav çavên axayî difirî. Êxo ewan tenê hêla û ji dîwanxanê derket.

215

BILÎCAN

Emer Axayî xwe li ser Şemoyi da pert kir û gotê:

— Bê emekê kurê bê emek! Bê nan û xoyê! Şîrheramê kurê şîrheraman!

Lawo ez dar û nedarên xwe, mal û halê xwe, namûsa xwe hîviya te va di-

hêlim, ko tu xinizî û dexesiyê li min bikî? Dexesê kurê dexesan!

Şemo xwe berev kir û got:

— Ezbenî çi bûye? Min çi kiriye? Dexesiya çi? Çi bûye? Bi gotinên wî ra ridêna wî ya riştebirincî dilerizî.

— Te van şevana çi dîtî ye?

— Min çi tişt nedîtî ye ezbenî!

— Te çi tişt nedîtî ye? Tu korî?

— Na ezbenî min çi tişt nedîtî ye. Ma çi kêm e?

— Tu min li ser da dixarînî?

— Axa bi serê te ez nizanim kanê tu li bara çi da diaxivî.

Dest û çokên wî tev dilerizîn. Axayî dîsan bi dengekî bilind û tûretir li

pêş da jê pirsî:

— Van şevan çi reş û meş li dora konan li ber çavên te neketiye?

— Reş? Reşê çi?

— Tu çima xwe gêl dikî? Reşê merivan!

— Reş? Na min reş nedîtine. Reş ? Na . Erê.

— Erê ew reşa kê bû?



— Him?  
 — Him û zehremar... dexesê kurê dexesan!  
 — Ezbenî min hema carekê tenê reşek dît.  
 — Ew reşa kî bû?  
 — Rengê Kerrî dida.  
 — Te li kîderê dît.  
 — Li nîveka konê Werdekê û dapîrê da.  
 — Ezbenî min ew nas kir. Ew hatibû sera hespan.  
 — Ha, we dest daye hevdu? Te taze digot min kes nedîtiye. Niha jî  
 tu  
 dibêjî Kerro hatibû sera hespan bide. Dexesê dola dexesan.  
 Bi vê gotina xwe ra rabû ser piyan û Şemo avîte nav tajankan.  
 Qareqar  
 bi Şemoyi ket. Dengê Şemoyi li dîwanxanê da lev geriya û ji  
 dîwanxanê  
 derket û giheşte nav konê aliyê malê. Li konê aliyê malê derbas bû  
 û be-  
 layî nav zomê bû. Jin û zarên mala Emer Axayî hatin li ber derê  
 dîwanx-  
 anê. Lê kesî newêrî navcîtî bikira. Axayî bi dilê xwe Şemo kuta. Hê jî  
 qareqara Şemoyi bû, ko li nav destên wî da vî alî wî alî direvî û hawar  
 hawara wî bû. Eyşanê koma keniz û kulfetan paş da da û bixwe  
 dakete

216 BILÎCAN

hundurê dîwanxanê û bi zorê Şemo li nav dest û piyên axayî da  
 deranî.

Axayî dujûn didane erd û asimanan. Dijûn didane Eyşan û Perîşan û

Macanê. Li nav hawar û gaziyên Şemoyi da çend tajank jî dawêşande

Eyşanê. Şemo bi arîkariya Eyşanê, xwe li nav destên axayî da deranî û bi

ser û guhên xûnavî, daliqiyayî daliqiyayî ji dîwanxanê derket û topal topal xwe bi konê xwe ra gîhand.

Eyşanê bi lavayî û pariyanan ji axayî pirsî:

— Çi bûye malava te êl li ser serê me da anî?!

— Tişt nebûye, mifirdiya te...

— Axa me rusva neke!

— Taze em rusva bûne.

— Axo çî bûye ji me ra jî bêje!

Axayî bînfişk vedidan û netebitî pêgermok lêdidan û dejûn didan Şemo û Ker û Werdek û Perîşan û Macanê. Eyşanê destê mêrê xwe kire

nav destên xwe û ew bi zimanekî li ser doşikê da rûniştandinê û gotê:

— Bêhna xwe fire bike evdê Xudê!

Axayî bînfişk veda û gazî kir:

— Kuro Êxo here gazî kurê Werdo bike, bila bê vira!

Bû repetepa lingê Êxo û bêy wê hindê ko bersiva axayî bide, ber bi mala

Werdekê revî. Lê paşî demeke kurt zivirî û hate ber derê dîwanxanê û

got:

— Axa li mal da nîne, çûye ravê.

— Dema ko ji ravê zivirî, bêjê bila bê bal min.

— Başe ezbenî.

Neimet mêjve bû ko axa li dîwanxanê da tenê hêla bû. Hê gava ko Êxo

çû peyê Şemoyi, hînga ew jî ji dîwanxanê derketibû.

Hê hêrsa axayî nedanîbû. Hê li nava dîwanxanê da bi bînfişk pêgermok

lêdida, ko cotên fêriz û pehlewanan li girê pêşberî malan ra li êlê fitilîn.

Her yekê jî cendekekî nêçîrê li terkiya wan bû. Kerrî dîsan bînanî caran,

serê Sosikê li ser mala axayî da zivirand. Hat û li ber derê konê aliyê malê

rawesta. Cendek ji terkiya Sosikê vekir. Bû şîrpîna cendekê karxezalekê û

kete erdê. Xulam û xizmetkar hatin û cendek li nav hev ra kirin û birin

aliyê malê. Kerrî pîçekê xwe gêzirand û çavên xwe gerand. Lê ne Perîşan,

ne jî Macan yek jî li ber çavan neket. Kerrî qestîka zîn û pûsadê Sosikê

serast kir û toza rê ji zînê wê weşand, ko Êxo pê ra gihîşt û gotê:

— Axa gazî te dike.

Kerrî hefsarê Sosikê da destê Êxoyi û hema wisan bi çek û rextên nêçîr-

217

BILÎCAN

vaniyê va dakete hundurê Dîwanxanê. Dîwanxane vik û vala bû. Axa

tenê bi lêv û loper li ser doşeka xwe rûniştibû û herdu destên xwe li pati-

ka xwe da şe kiri bû, diponijî.. Gava ko Kerrî derî lê vekir, xwe berev kir.

Kerrî silav lê kir. Lê bersiva silava Kerrî neda û gotê:

— Were vira nêzîk rûnê!

Ker hat û pêşberî wî rûnişt. Axayî lê pirsî:

— Tu li kêderê bû yî?

Ca bi vê pirsiyarê ra çavên wî li Ker û çek û rextên wî ket. Berqa nêza Kerrî da nav çavên wî û benda dilê wî lerizî û hindekî sist bû. Kerrî bersiv

da:

— Çûbûme nêçîrê, ezbenî.

Tûretî ji ser û çavên axayî dibarî. Rehên uskura wî rabibûn. Berê xwe li

ser Kerrî da kir û gotê:

— Lawo dema ko hûn li bal malxalana xwe hatin, hûn du sewlikên bê

ser û pa bûn. Şapik jî li ber we da tune bû. Min hûn xudan kirin.

Gîhandin. Ji xêra day û babê xwe ra hûn bi nan û av kirin. Hûn kirin dîwanî û palewan ko hûn li kutayê da têkeliya min bikin. Hûn dijî min

bilivin. Hûn dexesiyê li min li namûsa min bikin? Lawo tu seyê kîderêyî,

ko tu şev tê yî li dora mala min disimsimî? Ezê bidim bila te ji çavan ra

biguron û postê te tijî ka bikin.

Ker soromoro bû. Ta roja îro çi kesî weha dijûn nedabûne wî. Ker ta

roja îro ew dijûnan ji çî kesî nepejirandibû. Cinekî digotê hema rabe  
û  
nêzeyekê li sîngan ra bike, bila li navmilan ra derkeve. Lê dîsan bi  
zorê  
pêşayî ka xwe girt û serê xwe kire ber xwe da û xwe ji xwe ra hizirî  
û di dilê  
xwe da got:  
Doza namûsê ye. Pê hesiya ye. Ker di van hizrana da bû, ko axayî  
xwe  
lê tûre kir:  
— Li îro şûn da êdî ez naxwazim rûçkê we bibînim. Seb xatirê Mamê  
Îsi nebûya, minê tu bidaya berdebaran kirinê. Minê tu bidaya ricim  
kir-  
inê. Rabe biteqize here û mala xwe li nav zoma min bar bike! Tu kû  
da  
diçî here. Diçî kîj cehnemderê here!  
Îca bi vê gotinê ra ji ciyê xwe rabû û derkete derva. Eger Ker  
tevgirêdayî  
neba, eger çek û rextên nêçîrvaniyê li Kerrî neba, Emer Axa yê ew jî  
wekî  
Şemoyî bavîta nav tajankan. Yê ew bavîta nav paînan. Yê xwe li wî  
biceribanda. Lê gava ko Ker hate hundur dîwanxanê, berqa serê  
nêza wî  
li nav çavên Emer Axayî da rûnişt û çavên wî tirsand. Destkê xencera  
wî  
li nav kalanî da çilvilî û dilê axayî lerizand.

218 BILÎCAN

Li nav deng û dujînên Emer Axayî da Ker hêdîka derê dîwanxanê ra derkete derva. Dizgîna Sosikê ji destê Êxoyî stand û lê siwar bû û ber bi

mala xwe çû. Rûçkê wî bibû rûçkê sîrfiroşan. Lêv û loperên wî daketibûn. Gava ko çû malê, Werdek jî li mal bû. Werdek li kujekî konî

da rûniştibû û dihizirî. Mêj ve bû ko Werdek bi gerdeka Kerrî hesiyabû.

Lê gava ko Emer Axayî Şemo avîtibû nav tajankan, giştî êl jî pê hesiyan.

Ker hêdîka û bêy axiftin çû li ciyê xwe yê hemêşeyî da rûnişt.

Gava ko Emer Axayî dît ko nikare li Kerrî bide, dest ji Kerrî kişand û çû aliyê malê. Porên Perîşan û Macanê bi hev va girêda û ew herdu da ber

tajankan. Dîsan Eyşanê xwe avîte nîvekê û navcîtî kir. Kef li ser devê Emer Axayî ketibû. Dijûn dida erd û esmanan. Kûrekûra herdu kişikan

bû, digiriyan. Carî û keniz û kulfetên dî hemûyê xwe veşartibûn. Eyşanê

xwe avîte ser dest û piyên wî. Lingê wî kire devê xwe û gotê:

— Bide bo xatirê Xudê me rusva neke. Kiça me li nav eşîrên heşt bavan

da neçingîne!

Axayî çend tajank jî li wê dan û gotê:

Kiç teşiya dayîkê dirîse.

Îca bi vê gotinê ra ji mal derket û çû aliyê dîwanxanê. Dîwanxane tijî ridênsipî û giregirên êlê bibûn. Hatibûn, wekî her şev rûnên û bêjin û

bikenin. Lê wakî dîna xwe dane rûçkê Emer Axayî, dîtîna ko hewa ewrayîye, yekoyeko ji dîwanxanê derketin û dîwanxane ji axayî ra hêlan

û giyanê xwe rizgar kirin. Kes li dîwanxanê da nema. Emer Axa tenê ma. Wê şevê ta sibêdê xew li çavên wî neket. Ji bilî serê wî, wê şevê gelek

serên dî jî neçûne ser palgiyan. Gelek çav wê şevê bê xew man. Çavên ax-

ayî li ber kerb û kînê, çavên Kerrî li ber nedîtina yarê û evînê, çavên Şemoyî li ber êşa birînê, çavên Macan û Perîşanê li ber şîn û girînê, çavên

Neimetê Îsi jî li ber şabûn û pêkenînê. Wê şevê li her maleke êlê da bas

basa qewumîna rojê û bûyerên şevê bû. Tûrebûna Emer Axayî, hutikxwarina Şemoyî, bi hev va girêdana Macan û Perîşanê, ji nav êlê

raqetandina mala Werdekê bû çîroka şevê.

219

BILÎCAN

28

Şev da, mala Werdekê dane bar kirinê. Mala Werdekê ji nav malan raqe-

tandin. Berdanê li nav zomê deranîn. Mala pehlewana kirin barê çend

hêştiran û ji nav malan rakirin û berê wan dane piştî milê. Werdekê di

gel kuran, mala xwe li ser kaniya Rihanê, li pêşberî besta şoreketa

nêçîrgehê vegirtin, konekî çar istûnî û xîveteke sîpiye du kesî mil  
kutane  
hev. Werdek pir posîde û nevehsiyayî bibû. Destên xwe li ber hev  
ra  
kiribû, kûr diponijî. Dilê wê li ber hêrs û tûretiyê bînanî germava  
der-  
manavayê hildikeliya. Dil hebû çek û rextên xwe tev girêbide û bi  
cotên  
kurên xwe va hêrişî ser zoma Emer Axayî bike. Jê ra sivikatiyeke  
mezin  
hatibû kirinê. Mala wê bi destê zorê dabûne bar kirinê. Lê gava ku,  
di-  
hizirî kurê xwe sûcdar didît. Li ser gotina pîrejinên êlê, kurê wê nanê  
xelkê xwaribû, kujê sifrika wan jî jêkiribû. Lê Werdekê li bersiva wan  
da  
digot:  
Ma yê kiça xwe bidin kurekî ji kurê min çêtir!? Ez qet mûyekî leşê  
kurê  
xwe bi sed kiçên weke Perîşanê ra naguherim. Bila hê ewan lavayan  
bikin  
ko ez kiça wan ji kurê xwe ra bixwazim.  
Werdekê ev gotinan lalî xelkê digot. Lê li dilê xwe da digot: Xudê  
kem,  
bi şêx û şemsan herduk jî her hevkûfî hev in. Ma ne, her pêş da jî  
xizmi-  
natiya wan hebûye. Ma jina Mamê Îsi xûşka Emer Axayî nîne?! Ker  
kî ye?  
Ma birazayê Mamê Îsi nîne? Lê çima wisan dûrî xwe lûle dikin?! Ez



dizanim Emer Axa çima tûre bûye. Xebergerînan li bal wî dijî me  
axif-  
tine. Xeber li bin kewşên xwe deranîne. Gotine Axayî Ker her şev  
diçe  
diziya kiça te. Çima dizî ye?! Herduyan hejî hev kirine. Kebîna du  
evîn-  
daran li esmanê heftê hatiye birînê. Diviya Emer Axayî ji min ra  
bigota.  
Yan jî hema min gereke pêşdestî li wan bikira û bişanda xazginî.  
Wekî  
min bişanda xazginî Emer Axayî nedigot na. Lê xebergerînan kar  
aloz  
kirin. Evîndariya wan kirin leka rûyê Emer Axayî. Êdî ketiye stuyê  
Emer  
Axayî. Êdî kar pir dijwar bûye.  
Werdekê xwe ji xwe ra ev xeberan li dilê xwe da digot û dihizirî.  
Roja paştirê malên li ser kaniya Rihanê bûne du mal. Mala dapîrê jî  
bi

## 220 BILÎCAN

destê zorê dane barkirinê û ew jî li ser Werdekê da şandin.  
Piştî barkirina mala Werdekê, hat û çûyeke neasayî ketibû nava êla  
Emer Axayî. Mirovên vê zomê diçûne zoma han, yê zoma han  
dihatin vê  
zomê. Êl ser û binî hevdu bibû. Li her zomê da li malekê yan li du  
malan  
da qur û pistek hebû. Hindekan hejiyareyên taybetî didane hev. Li

guçkên hevdu da diaxiftin. Ewan ko hay jê tunebûn, we dihizirîn ko ew  
hat û çû, ew got û bêj û hejyarana li ser evîndariya Ker û Perîşanêye.  
Lê  
ya rastî ew hej û kel û hat û çûya tişteke dî bû.  
Li nav êla Emer Axayî da, li nav hozên heşt bavan da, hindek malên  
dereke û ne ji hoz û bereya êlê jî li nav êlê da hebûn ko hejmara  
wan ji  
hezar û pêncsed malê zêdetir bû. Emer Axa û dîtir serekhoz û serek-  
zomeyên êlê gelekî zor û zordarî bi van malan dikirin. Ewan didane  
cenceratê û bêgarî û seraneyên zêdepar bêş û bacên neasayî ji wan  
dis-  
tandin. Gava ko ev malan pê hesiyan ko Emer Axayî mala cotên  
pehle-  
wanan ji nav êlê raqetandiye, tev ketin şêvr û got û bêjê.  
Ridênsipiyên  
wan lev berev bûn û şêvir giran kirin û ro kirin û pîvan li kutayê da  
hatin  
ser wê biriyarê ko ew jî malên xwe li şev da bar bikin û herin û bigîjin  
mala Werdekê û ewan ji xwe ra bikin serok û pêkve bi serokatiya  
Kerrî  
hozekê çê bikin. Rîsipiyên wan gotin:  
Nabe ko em vê derfendê ji dest xwe derdin. Gereke ko em li helê  
wêcê  
vegirin û wan xasmêrên han tenê nehêlin. Evana mêrên rojên tengî  
û  
taliyê ne. Emê Ker û Kuliki ji rojekê ra xudan bikin. Mirovîên zana û

hişiyar mêrên weha ji dest xwe naken. Werin em hemû dest bidin  
destên  
hev û li dijî zor û zulma Emer Axayî rabin şipê û li hember êla wî da,  
ji  
xwe ra êlekê saz bikin û ji bin destên evî zalim derkevin. Rabin em  
hemû,  
em gijik dest bidin destên hevdu û ji malên ji hev belav bûyî û bijiqî  
êleke  
hevgirtî çê bikin. Eger em hemû dest bidin destên hev, emê êleke ji  
êla  
Emer Axayî girantir û bitewtir jî serast bikin. Li bin va xeberê bidin  
hemû  
malên ney ji êlê, bila îşev hemû bar bikin. Emê îşev li jêr destê Emer  
Axayî derkevin û herin bigîjin Werdekê û cotên pehlewanan.  
Taze tarî dikete erdê, ko li her zomeyeke êla Emer Axayî da çendîn  
kon  
bi hevra ketin. Bû şîrp û tîrpa stûnên kon û xîvetan. Mal li hesp û  
hêstir  
û hêstiran kirin û pez û dewar û hesp û hêstirên xwe dane pêşiya  
xwe û  
ber bi kaniya Rihanê rêketin. Hemû li nîviya rê da gihîştin hev.  
Ridênsipiyan gotin:  
Malê pezekê û tejek kon bînin. Malê pezek, hezar û pêncsed pez.  
Malê  
tejek kon, hezar û pêncsed tejê koni. Keriyê pezî dane pêşiya xwe û  
bi  
221  
BILÎCAN

deng û hera û duruşm ber bi mala Werdekê rê ketin. Hê hewa gewir  
nebibû ko Werdek bi kurên xwe va, bi dengê duruşman û kalekale  
pezî ji  
xew rabûn. Hezar û pêncsed malî dor li konê Werdekê girtin. Ker  
hate  
pêşiya wan. Ridênsipiyên bûyer ji Kerrî ra şirove kirin. Ker hawarî da  
dayîka xwe. Werdek bi wê hawariyê pir şa bû.  
Werdek hate pêşiya wan û bixêrhatinî û serçavanî da wan û got:  
Hûn gelekê bixêr û xweşî hatine. Li ser serê Werdekê û cotên kuran  
ra  
hatine. Hûn hemû jî bînanî kurên min, wekî Ker û Kulikin...  
Dengê Werdekê li nav dengên mirovan da, li nav gazî û qûtîna şivan  
û  
gavan û malîvanan da, li nav kalekale pezan, barebara bizinan,  
oreora de-  
waran, norenora hêştiran, şîhîna hespan, qîrîna mirîşk û kelokan,  
rewterewta seqan û girîna zaran da bezir bû.  
Komelê dest pê kirin. Tejên konî bi hev va dirûn. Li qasekê da konekî  
hezar û pêncsed tejî dirûn û amade kirin, bû ringeringa mêkutan û  
kon  
li ser kaniyê vegirtin. Yêkatî, arîkarî, yarmetî, zibare, hevdestî,  
hevratî,  
tifaq mirovî digehîne hemû miraz û daxwazan. Komelê bi yêkatî û  
arîkarî  
di gavekê da konekî taze ji kurên Werdekê ra vegirtin. Konê kurên  
Werdê, bû bîna mija li rûyê erdê.  
Hê sibêde baş temîz nebibû, ko konekî çilistûnî li ser kaniya Rihanê

hate vegirtinê û keriyekî hezar û pêncsed pezî li besta binya kaniyê  
da bi  
se û şivan xerîkî lewerînê bû. Li dû ra bû ringeringa mêkut û singan  
û  
komelê dest pê kirin, konên xwe jî li rex konê Werdekê vegirtin. Êla  
kurê  
Werdekê der û deşt da ber xwe û per veda û ber va çû. Hezar û  
pêncsed  
malî mil kutane hev; konan li dora konê kurên Werdekê da ger  
lêdabû û  
konê kurên Werdekê bînanî qaşeke gustîlê li nav hev da girtibûn.  
Lokoyê  
begzade û Elikê mitrib ringandin duholê û tûtandin zurnayê.  
Miqamê  
şayê lêdan. Dengê duholê kete çil û çiyar û xewa êla Emer Axayî ya  
berbangê herimand. Xelkê êlê ji çadir û xîvetan derketin û guhdarî  
li  
dengê duhol û zurnayê kirin. Begzadan li miqamekî hind xweş  
lêdidan,  
hema hindik mabû ko xelkê êla Emer Axayî jî li ber wî miqamê şa  
destên  
hev ra bigirtana û dîlan bigerandana. Emer Axa bi dengê duholê û  
gazî û  
heraya komelê ra ji xew rabû û pirsî:  
Kuro ew dengê wê duholê ji ko tê!?  
— Ezbenî ji ber derê mala kurên Werdekê tê.  
— A, bila ji xwe ra mirtibiya xwe bikin.  
Piştî demeke xurt hawarî ji Emer Axayî ra hanîn, ko êleke giran li ser

mala kurên Werdekê daniye.

222 BILÎCAN

Emer Axa tûre bû û gazî kir:

Ca çend kes ji we herin û bizanin kanê ew çawa êle?!

Bixwe jî tabetî nehatê û gazî kir:

— Kiçê Perîşan ca ewê dûrbînê ji min ra bîne kanê.

Perîşanê dûrbîn jê ra anî. Te digot qay xwelî li ser Perîşanê da dabêtine.

Pirçûk dabû. Reng li rûçikê wê da nemabû. Lêvên wê yên gêlasî bizmirî

bûn. Çavên wê yên belek kor da daketibûn. Lemisî bû. Bînanî pişîkeke

pelûr li ser da rijiyayî lê hatibû. Şikestibû. Serê wê di ber da ji bavê xwe ra

dûrbîn anî. Gava ko dûrbîn da destên bavê xwe jî, serê xwe li ber xwe

derneexist. Li nav çavên bavê xwe mêze nekir. Bavê wê li nav birû û bijan-

gan ra avirek dayê. Avira bavê xwe nedît.

Emer Axa dûrbîn li desti da, ji nav malan derket û xwe da girê pêşberî

malan û dûrbîn da ber çavên xwe û li ser kaniya Rihanê gerand. Dîna xwe

dayê çi! Êleke giran li ser kaniyê daniye, konekî hê ji konê wî yê dîwanx-

anê mezintir li nîveka êlê daye. Dûrbîn li ser xelkê ko li nava êlê da di-

hatin û diçûn gerand. A, ewa hanê Zerdê ye. A, ewê hanê Heskeçel e.

Ewkê hanê jî Remo Rûto ye. A, ewê hanê ko ber bi wî konê giran diçe,

ew jî Kajo ye. Emer Axa ew hemû nas kirin û li ber xwe da hurmicî û pirsî

kuro lê ev çima çûne, lo?!

Li van bîr û hizrana da bû ko Neimetê Îsi xwe pê ra gîhand:

— Xalo Kero ya xwe bi me kir. Leke li me da û li ser da jî êl li ser me bir

kir. Nîvê êlê xwe dane ser wî. A, ew konê reşî erebî, ewê hanê mezin jî

hevhişiyên wî jê ra berev kirine. Ew keriyê hanê ko li biniya kaniya Rihanê diçêre, ew jî keriyê wiye. Ew jî dîsan hevhişiyên wî jê ra dane hev.

Ew Kero ji xwe ra kirine serok. Te dît, her li roja roj da gereke te ev êtî-

mana ev sewlikana xudan nekira. Te evan mezin kir, ko roja îro hem em

bêabûr kirin, hem jî êl li ser te bir kir. Hê li ser da jî Kero gotiye, ezê ax-

atiyê ji Emer Axayî bistînim. Axatî berê li binemala me da bûye. Ezê hema van rojana herim ba kardarên dewletê û qeyd û qoçanên kalkê xwe

derxim.

Çokên Emer Axayî sist bûn. Qudûmên wî işkestin. Hema li ciyê xwe da rûnişt. Neimet kete bin milan û ew li girikî ber bi malê anî.

Li bal axa û serokhozan birkirina êlê bi wateya ragehandina serxwebû-

na bindestan û tunekirina axayan bû. Birkirina êlê ji kuştina mêran û ji

zorpeskirina cî û waran, heylo ji doza namûsê jî girantir bû.

Hawariya êl birkirina Keroyî, mezinatiya konê wî, keriyê pezên wî, serokatiya wî bînanî birûskê li nav êlê da teqiya û li qasekê da komel

223

BILÎCAN

hemû pê hesiyan. Şîn li ser êlê da hatibû. Êl bibû, du êlan. Dutîretî ketibû

nav êlê. Hemûyan meidê xwe kiribûn. Wanên ko pê xweş bûn jî, derew

da pirçûkên xwe kiribûn.

Her tenê li nav êla Emer Axayî da mirovek tenê, tek mirovek keyfxweş

bû. Çavên wê yên belek dikeniyên. Tilîlî dihatinê. Dilê wê xweş û beşera

wê geş bibû. Ew jî Perîşana giraviya Kero bû. Pêş da posîde bû, lê dema

ko bihîst, berdilka dilê wê êl bir kiriye û bûye serokê êlê û xudanê konê

çilistûnî, êdî tilîlî hatinê. Perîşanê êdî li ser xwe ra avîtibû. Êdî şerma wê

şkestibû. Gava ko navê Kerrî dihat. Keyfxweş dibû. Şa dibû. Dikeniya.

Dema wê saz dibû.



Emer Axa û Neimetê Îsi xwe gîhandin dîwanxanê. Neimeti gotê :

— Xalo tevbîr!

— Pîlan, Neimet pîlanekê çê ke! Bi pîlan nebe, em bi kurê Werdo nikarin.

Xal û xwarzî tenê di hundurê dîwnxanê da şêvir giran kirin.

224 BILÎCAN

29

Hindî cîhan ava bûye. Hindî ko topa cîhanê ketiye ser tebera xwe û geriyana wê rêk ketiye. Hindî ko mirov li ser rûyê vê topê peyda bûne.

Hindî ko jiyane li ser vê topê dest pê kiriye. Mirovan bi hiş û zanîn û karîn û şîyan û viyana xwe gelek astengên giringe jiyana komelayetiyê ji

holê rakirine. Li dijî her cure gîrodarî û tengî û taliyên jiyane çareyek pey-

da kirine. Ji her nexoşiyekê ra avêşek, ji her kulekê ra merhemek, ji her

derdekî ra dermanek peyda kirine. Hindî ko cîhanê gera xwe rêk kiriye,

mirovan bi hiş û têkoşîna xwe her çî xwastine kirine. Roja îro li saya wê

têkoşîn û hişiyariyê da mirovî dikare ji balindan baştir fir bide. Ji masiyan

çêtir somekariyê bike. Li saya wî hişî da dikare ava ko tim û tim serberjêr

herikiye serhevraz biherikîne. Hêkekê danê rojhalatê û ya dî danê rojava

û li yek çavlêdanê da herdu hêkan bi hevra bibîne. Li vî serê cîhanê digel  
wî serê cîhanê biaxive. Hîv û istêran dagîr bike. Koşk û saxtumanan li ser  
istêrkan ji xwe ra ava bike. Li dilê avê da agiri derbîne. Li vî serê cîhanê  
rûnê, rojnama ko li wî serê cîhanê tê diweşandinê, di gavê da heylo berî  
wê hindê ko ew rojnama giheştibe destên şênîyên wî welatî, bixûne. Lê ta  
roja îro tenê çare û dermanek ji mirinê ra peyda nekirine. Ra li her tiştî  
kirine, tenê ra li mirinê nekirine. Ta roja îro gelean temenên xwe li vê  
rêkê da pûç kirne. Li dû ava jîyanê û gîhayê hermanê geriyane. Gelek  
Kelgamêşan û Xizir û Îskender û Îsfendiyaran canê xwe li vê rêkê da ji  
dest dane, lê bêakam û bêçine bûye. Kesî neşiyaye, pêşîya mirinê bigire.  
Mirin rastiyeke tal e. Her tişt bivê û nevê dê rojekê şerbeta mirinê tam  
bike. Her tiştê ko jiya be, dê rojekê jî bimire. Çi kesî ta roja îro neşiyaye  
berayîka mirinê bigre. Gelo rojekê bê ko mirov bişê evê pîrhepokê jî de-  
vgem bike û ji wê ra jî çare û dermanekî peyda bike? Bêgotin hiş û karî-

na mirovan bê sînor e. Dê rojekê bê ko dermanê vî derdê bêderman  
jî

peyda bibe.

Sereşivanê mihiyên Mîr Elî Siwaran, Mîrê Ereban, Kakilê mêrê Kinê,  
ev demanekî dirêj e ketiye nav nivînan. Kuxtekuxta wî ye, dikuxe û  
xûn

vedireşe. Ridêna wî ya sipîçîl bîzbîzî bûye û li bin lihêfê da derketiye  
der-

225

BILÎCAN

va. Li sebedê dide û kûr dinale. Nalîna wî ji ciyekî kûr tê. Lê malçola  
kuxikê nahêle ko belengazî ji dil û can binale jî. Her cara ko kuxka  
wî tê

neşê rûnê. Li nav nivînan derdikeve, qûnkî rûdinê. Li dû hev dibe  
kux-

tekuxta wî, gelek caran jî bêhna wî digire û neşê bikuxe jî. Di demên  
we-

ha da, rengê wî reş û şîn dibe. Li dest û piyan dide. Destên xwe dide  
ber

devê xwe û lal dibe.

Zaroyên wî lê berev bûne. Li kûraniya çavên Kakîlî da nihêraniyeke  
sosret diyar dike. Çavên wî yên kûr da daketî, dibêjin mirovan ko  
dixwazin tişteke bêjin, lê nawêrin. Li dev û dorên xwe dinihêre.

Çavên

xwe li mirovan digerîne. Carinan eger yekî nenas bibîne, wisan kûr  
û hûr

lê dinêre, tu dibêjî qay dê wî mirovî bikire. Bi çavekî bikir û sosret û zen-  
demayî û demeke pirsiyarkerane li mirovan dinêre. Piştî lênihêrîneke dûr  
û dirêj, lênihêrîneke tirsêner û bi saw serê xwe dike ber xwe da. Serê wî  
wisan dikeve ber da, tu dibêjî li wê lênihêrîne şerm dike. Poşman dibe.  
Serê wî şor dibe. Serê xwe bi nîşana nebawerî û poşmaniyê wî alî û vî alî  
dihejîne û li dû ra eger kuxik derfendê bidê da, kûr diponije.  
Jina wî, Kinê li ber seri rûniştiye û lê dipirse:  
— Kakil tu çima serê xwe wisan dihejînî? Tu çi dixwazî? Kîdera te diêşe?  
— Bişînin peyê.  
— Peyê kê?  
— Peyê...  
Lê kuxika malçol molê nadê. Li ser hev dikuxe û li dû kuxikê ra dinale û li sebedê dide.  
— Em bişînin peyê kê Kakil?  
— Bişînin peyê...  
Lê dîsan kûr dikuxe û li ber kuxikê reş û hişin dibe.  
Zaroyên wî hemû li dorê kom dibin. Bi girîna Kinê ra, kûrîn bi zaroyan jî dikeve. Kûkekûk dikeve mala Kakîlî da. Bi girîna zaroyan ra, hêsireke zirav li korika çavên Kakîlî derdikeve û li ser rûmetê wî yê qerçimî ra dişûlike û ber bi cengela ridêna wî ya kever diherike û li nav  
ridêna wî da winda dibe.

— Herin peyê...

Lê dîsan jî kuxik nahêle gotina xwe kuta bike.

— peyê kê?

Radibe û li ser xwe dirûnê. Pê dermilkê kirasê xwe xûn û gilêza ko li ser

devi ketiye, paqîş dike:

226 BILÎCAN

— Bişîne peyê Hesê Dûdêyî û Mela Ehmedî.

Dîsan dibe kuxtekuxta wî û vê carê deverû dikeve ser nivînên xwe.

Jinka wî kûr diponije. Başê Mela Ehmed yê bê li ser da yasîne bixûne, lê

ew çima dibêje bişîne pê Hesê Dûdêyî?! Kengê xêr û şera Kakil û Hesê

Dûdêyî pêkve hebûye? Tevaya Hesê Dûdê û Kakîlî weke tevaya fîl û fîn-

canê ye. Ew palewanê êlê. Bavê heşt palewanan. Xezûrê palewanê gorbi-

hîşt Silêmanî. Ev şivanekî guhê gundan?! Gelo çi karê wî bi Hesêyi ketî

ye?!

Kinê peş da we hizirî ko mêrê wê li ber bestan diaxive. Lê li ber bestan

nebû. Mêrê wê hişiyar bû. Got qay li ber nehişiya mirinê ye. Dîsan devê

xwe bire ber guçkê Kakîlî û lê pirsî:

— Te got bişînim pê kê?

Kakil bi tûretî dupate kir:

Peyê Hesê û Mela Ehmedî!

Jinkê nizanî li ber çî dişîne peyê Hesêyi. Di gavekî da hezaran bîr û hizrên aloz li nav serê wê da geriyan. Pê kujê xavika xwe paşiya çavên xwe

paqij kir û zarekyê xwe şande peyê Mela û yek jî şande peyê Hesêyi:  
— Kuro Temo tu here peyê Mela Ehmedî û bêjê bavê min li ber nezia

ruhe, Mela dixwaze. Bila were xêra Xudê ra yasînekê li ser da bixûne.

Kuro Lemo tu jî here peyê Hesê Dûdêyî û bêjê bavê min li ber giyandanê

ye, te dixwaze. Bêjê gotiye karekî minî zor giring pê heye de zû herin kurên baş!

Vêca bixwe jî li ber serê mêrê xwe yê hişveçûyî rûnişt û hûrik hûrik hêsir barand.

Lemo xwe bi mala apê Hesê Dûdêyî ra gîhand û li ber derê konî gazî kir:

— Apê Hesê! Apê Hesê! Bavo li ber mirinê ye. Dibêje bila Apê Hesê bê

serekî li min bide. Dibêje bila zû bê.

Hesê li nav hişê xwe da çû. Axo li nav vê êla giran ewî çima li sere-merga xwe da şandiye dû min? Hindî Hesêyi ro kir û pîva, hegera wê

hindê nizanî. Bi hizirîn apinciyê xwe avîte milê xwe û destên xwe avîte

stûna koni, xwe bi stûnê va girt û gopalê xwe xwast. Zaroyan solikên wî

danîn û gopalê wî dane destî. Hesê topaltopal ji mal derket. Heyî

dinyayê fenayê! Eva Hesê Dûdê ye. Navê wî dihat pilingan tûk di-  
werandin. Serê palewanên rom û ereb û eceman vedihêra. Vêca  
niha bi  
gopalî digere. Xwe bi dîwar û stûnan va digire. Gava ko bixwaze  
rabe,  
bi destî ra digirin. Hey cîhana xortxapîn! Hey yara derewîn! Hezar  
227

## BILÎCAN

qeziya bêne te derewîna bêy paşbend!  
Hesê hêdî hêdî bi yarmetiya gopalî di gejl hezar cure hizir û xiyalan  
ber  
bi mala Kakîlî hejiya. Ta roja îro qet carekê jî digel Kakîlî rû be rû  
nebûye. Tenê car caran gava ko Kakil dihate ciriya şivanî, dûr va  
qiyafetê  
wî didît.  
Li nêzîkiya mala Kakîlî Hesê rastî Mela Ehmedî hat. Ewî û Mela  
Ehmedî silav dane hev û piştî xoşbêjiyê, Mela Ehmedi ji Hesêyi pirsî:  
— Weha bi lez kî ve?  
— Kakîlî şandiye dû min.  
— Şandiye dû min jî.  
Tev rê ketin û pêkve gihîştin ber derê mala Kakîlî. Dengê şîne û  
girîne ji  
mala wî dihat. Çatorê Kakîlî li biniya malan, li ser du stûnan, li ber  
bayê  
wekî mêjokan dihejikî. Mela Ehmed û Apê Hesê çûne jor. Kakil linav  
dstek nivîne qirênc da ketibû. Nalenal û kuxtekuxtê. Keriye zarên  
hûr jî

xwe dabûne dora cî û nivînên wî. Çavên hemûyê şil û stuyên wan jî  
xwar  
bû. Mela Ehmed û Apê Hesê li rex wî rûniştin. Her dûyan jî ji dema  
wî  
pirsîn. Kakîlî bi dest û dev bersiva wan da. Apê Hesê jê pirsî Kakil  
Xudê  
xêr ke, te çima şandiye dû min. Kakîlî bi kuxtekuxt û nalenal giştî  
qewumîna şeva hawariyê û pîlanên Ehmed Begî û kuştina Silêmanî  
hemû ji Apê Hesê û Mela Ehmedî ra deve bi derziyê va kir û got:  
Apê Hesê li gerdena min belî bike, ez hatim xapandinê. Bi vê gotinê  
ra  
li jêr qerpalê xwe da kîsikek zêr deranî û raberî Hesê û Mela kir û di  
gel  
wê serê wî li ser stu da leq bû, kîskê zêran ji destî ket Apê Hesê gotê  
min  
li gerdena te aza kir. Bû kûrekûra zarên. Mela Ehmedî jî dest bi  
xwendi-  
na Quranê kir:  
Yasîn, welquranelhekîm...  
Dengê wî li ser hemû dangan ket.  
Kinê bi şîn û girîn lingên mêrê xwe rast kir û ew ber bi quble kir û  
çavên  
wî bi destên xwe damiçandin.  
Bi dengê yasîna Mela û şîn û girîna jin û zaroyan ra, yekê xwe da  
fêza  
malan û gazî kir:  
— Hay yezdan ji miriyên we xweş be! Kakil cûye ber dilovaniya  
Xudê.



Herin goristanê.

Gotinên ko ji devê Kakîlî ra derketibûn, her di rojê da li nav êlê belaw

bû. Li seranserî êlê da jînk û kurik û kiçik û ahil û cahilan ev xeberana ji

devên hevdu direvandin:

228 BILÎCAN

— Ehmed Beg û Remo pehlewanî li Silêmanî dane. Silêmanî jî li wan daye.

— Her sê pehlewanan hevdu kuştine.

— Kaku gotiye, hawarî derew bûye. Ehmed Beg û Remo pehlewan ji

Silêmanî ra telbend venîbûne. Ewan xwesitibûne Silêmanî bikujin.

Bixwe jî ketine wê telbendê.

— Erê da mirov ji hevalê xwe ra gorê bikole, bixwe jî dikeve wê gorê da.

— Gorkol her dem li binê gorê daye.

— Belengazî Silêman !

— Ew çavnebaran çawa nehîştin hema salek li ser zemawenda wî ra

derbas bibe.

— Çawa bêmiraz çû.

— Kuro mêrxasekî çawa bû, bixwe tola xwe vekir, paşê mir.

— A, li batî xwe du mêr kuşt, paşê mir.

— Sê mêr. Lê tu Miho mêr nahesibînî!?

— Erê kuro rast dibêje sê mêr li ber xwe da kuşt û paşê mir.

Ev xeberana dev bi dev li nav êlê da digeriyan. Vêca jinikan her lalî  
xwe

ra hindek pelg û çiq lê zêde dikirin:

— Kakîlî gotiye, Silêmanî hema li pilekê da hersêk kuştiye.

— A, hersêkan bi hev ra para va li Silêmanî dane. Silêman birîndar  
birîndar li wan ziviriye û hema di pilekê da hersêk kuştiye.

— Na, na, hespê Silêmanî silikiye, Silêman li erdê ketiye, paşê ewan  
hema wisan li erdê li Silêmanî ba ketine. Hema li erdê li Silêmanî  
dane.

— Na, na Silêman li ser çepa bexlecî da li vî alî banz daye alî yê dî,  
hes-

pê wî banzd neqedandiye. Ew û hesp tev ketine binê zanga xûnê û  
paşê

ewên dî lêdane.

— Na, na qirikê ewan li hev dane, her sêkan bi hev ra li Silêmanî  
dane.

Silêman birîndar bûye. Birîna wî kûr bûye, lê dîsan jî li ber xwe daye  
û

birîndar birîndar her sêk dijminê xwe kuştiye, paşê li hespê da  
ketiye ser

termên neyarên xwe.

— Qirikê dibêjin Kako gotiye, gava ko ewan li hev didan, ew jî li fêza  
kevirê hirçê rawestayê û li şerê wan temaşe kiriye.

— Way lê gor bi gorî!

— Serê sebebên ew bû.

— Way lê li gora xwe da nesitiriyî!

Piştî servebûna raza kuştina Silêmanî, dilgiraniyeke mezin kete  
nîveka

mala Mîrê Ereban û Hesê Dûdêyî da. Mala Hesê li nav malan bar kir  
û

229

BILÎCAN

berên xwe dane Erebanê. Mîrê Ereban bi jin û zaran va çûn xwe  
avîtin

Hesê Dûdêyî û nehîştin Hesê here Beriyê. Lê Hesê nepejirand. Mala  
xwe

du sê êvirgehan dûrî mala Mîrê Ereban danî. Li dû barkirina mala  
Hesêyi

ra her çî Êzdî li nav êlê da hebûn ewan jî malên xwe bar kirin û çûn  
gi-

hîştin mala Hesêyi. Tev bûn êleke giran.

Êl li ser Mîrê Ereban hatibû birkirinê. Hem jî bi wê qewimînê Mîrê  
Ereban komek mêrxas û pehlewanên navidar û bi taybet her heft  
kurên

Hesê Dûdêyî ji destê xwe dabû. Mîr herdem ridênsipî û giregirên êlê  
berev dikir û bi wan ra şêvir dadinî, da ko rêyekê peyda bikin û dilê  
Hesê

Dûdê û kuran vekire. Lê Hesê Dûdêyî nedipejirand.

Bi veqetiyana Hesê Dûdêyî ra ji êla Mîrê Ereban, dijmin û neyaran  
serê

xwe lê rakirin. Êla Ereben Hunus ko ewa çendîn sal bû, bêşdar û ser-  
anederê êla Mîrê Ereban bû, ji dayîna bêşê û seraneya salan e,  
serbadanî

kirin. Hevhêsiyên wan yê rojavayî dest pê kirin kewşên wan  
zorpes

kirin. Roj bi roj ji desthelardariya Mîrê Ereban kê m û kêmtir dibû.  
Hê sala veqetiyana mala Hesê Dûdêyî ji êla Mîrê Ereban kuta  
nebibû,  
ko Hesê jî çû ber dilovaniya Xudê. Hesê li bisparteya seremergê da  
gotibû  
kurên xwe.  
Rasiparda min li we be, hindî ko hûn hene, serê xwe li ber axa û  
xanan  
da xwar nekin. Lê gava ko we dît welatê we ji aliyê neyar û dijminan  
da  
dikeve ber bûveya nemanê, li her kî alî welat da be, herin bergiriya  
welatê  
xwe bikin. Ya mala Mîrê Ereban jî hindî ji dest we tê, tevaya wan  
nekin,  
lê nebî nebî hûn wan li rojên qawmeqûtên giran da, li ber hêrişên  
neyar  
û bîhaniyan da tenê bihêlin. Me û ewan tev nan û xoyê xwariye.  
Eger  
ewan hawariya xwe li we daxistin, lawo rasparda min li we be, li  
hawariya  
wan da herin, lê serê xwe jî li ber wan danenên. Şerê wan jî nekin.  
Tevaya  
wan jî nekin.  
230 BILÎCAN

30

Buهران dema ko erd li gul û çîçekan da dixemile û çil û çî, deşt û  
banî,

mil û bêlan li kulîlkên rengareng da winda dibin, xêlat û koçer bînanî  
kuliyan hêrişê didene çîyan û xîvet û kon û çadirên xwe li ser kanî û  
rex

cok û cobaran vedigirin. Hê xêlatan bêhna xwe venedane ko dest-  
dest-

edîwane û derwêş û begzade keşkûl û defik û neyîk û duhol û  
zurnayên

xwe hildidin û ber bi zomeyên xêlat û koçeran rê dikevin û ji vê  
zomê bo

zomeya han, ji vê êlê bo êla han digerin û dikevin rêza malan û para  
xwe

dixwazin.

Gava ko derwêş û dîwane digîjin biniya malan, telbik û defikên xwe  
didin ser destên xwe û ji komelê ra bi teqil li telbik û defikê didin.

Pişka

zore derwêş û dîwaneyan bi miqamê telbikê ra bi aheng beytan jî  
dixûnin. Beytên wekî; beyta Hespê reş, beyta Memo û Zînê, beyta  
Xecê

û Siyamendî, beyta Ferx û Sityê, beyta Şêxê Senianî, beyta  
Dimdimî,

beyta Zembîlfiroşî û bi dehan beytên dî. Hindek ji wan jî helbestên  
evîn-

dariyê ji dîwanên Melayê Cizîrî, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê  
Xanî û Axayokê Bêdarî û Siyapoşî bi ahenga difikê dixwînin. Li nav  
giştî

helbestên ko ew dixwînin, helbesta; Dil ji min bir, dil ji min. ya  
Melayê

Cizîrî ji hemûyê xweştir û bi nav û bangtir e. Bi bihîstina wê helbestê  
ra

bi sedan genc û law û evîndar li dora dîwaneyên beytbêj berev  
dibin. Ca

li dû xwendina beyt û helbestan ra dîwane dikevin rêza malan û  
keşkûla

xwe berev dikirin.

Hê derwêş û dîwaneyan zome û êl cî da nehêlayî, ko begzade dest-  
edeste, siwarê hêstir û guhdirêjan dikevin nav zomeyan. Begzade  
pêş da

xwe didine biniya malan. Miqamekî şad lê didin. Qîz û xort, law û  
ciwan

li dora wan berev dibin. Dilîzin û xwe heldavêjin. Li dû leystin û  
helperkê

û dîlanê ra, begzade dikevin rêza malan û mal bi mal digerian. Her  
mal

tiştekekê didenê. Begzade li gelek malan da jî, li malên ko li ser gotina  
wan

av jê germ bibe, rûdinên û ji şênîyên malê ra li neyîkê didin.

Bi vî cureyî begzade û derwêş û dîwane zome bi zome digerin. Xelkê  
keyfxweş û demsaz dikin û bixwe jî berîk û berpişt û tûrik û kîsik û

231

BILÎCAN

keşkûlên xwe dadigrin.

Emer Axa û Neimetê Îsi hê li dîwanxanê da rûniştine û kûr li ser hev-  
du da diponijin. Dengê duhol û zurnaya Elo û Deloyê begzade jî  
nikarî

ewan li nav deriyaya hizr û ponijîna kûr derîne. Eve demeke xurt e,  
ko ro  
dikin û dipîvin. Nexşe û pîlanan dikişînin û gîran dadirêjin û  
telbendan  
radiçinin. Teleyan vedihunin. Lê tişteke li ser tişteke naxin. Dikin û  
nakin nikarin ji lawên Werdekê ra teleyekê venên. Her nexşeya ko  
dikêşin, li ser nagire. Hemû ponj û hizirînên wan pûç derdikeve. Di  
vê  
demê da Elo û Deloyê begzade bi def û duhol û zurna û neyîkên xwe  
va  
derê dîwanxanê li ser xal û xwarziyan da ve dikin û weha silavê li  
wan  
dikin:  
— Ji we ra wîşt!  
Neimet û Emer Axa weke çawa ji xeweke giran hilpekin, serê xwe  
rakirin. Emer Axa weha bersiva begzadan da:  
— Wîştta we li ser wîştê be! Day û babên we li bihîştê be!  
Emer Axa bi dîtina begzadan ra, ew jî begzadên weke Elo û Delo  
cîhanger ra xwe keyfxweş nîşan da û weke her car bi devken û yarî  
digel  
wan dest bi axiftinê kir:  
— Fermon! Fermon! Begên xoşewîst! A, werin li dera han rûnên!  
Hûn  
zor zor bi xêr û xweşî hatine.  
Lê her çend ko Emer Axa têkoşî ko nevehesiyana xwe veşêre, nikarî.  
Begzadên diniyadîtî û gerîde her li yekimîn avirê da zanîn ko  
bûyerek  
heye, lê nezanîn çî ye.

Elo begzade, begzadeyekî bi zar û ziman, xeberxweş, zimanşîrîn û  
mêrxapîn û pesinbêj û berîkvalaker bû. Biçûya dîwanxana kê, hind  
pes-  
nê wî fikir ko ew bixwe jî li xwe gumandar dibû. Ca Elo begzade bi  
vê  
hunura xwe berîkên xan û axa û beg û mîr û mîrekan bi sanahî li ser  
xwe  
da vala fikir. Ew begzadeyekî cîhandîtî û gerîde û çavvekirî û bi dev  
û  
çene û neyjenekî hosta û dengbêjekî bi nav û deng bû. Li dîwana kê  
da  
rûnişta, dora axiftin û qisedanê nedida çi kesî. Ew seranserî  
Kurdistanê  
peyatî geriyabû. Ewî giştî serokhoz, axa, xan, beg, mîr, mîrek û  
serdarên  
Kurdistanê bi nav û nîşan di gel navên jin û kiç û kurên wan va  
dizanî. Li  
kîşk dîwanê da rûnişta, rêya qisedanê nedida çi kesî. Bi qewlik û  
çîrok û  
stiran û serhatiyan dîwanxane şên fikir. Gelek caran ewî wek  
pisporekî  
kîrî û rewannasekî lêzan wisan li reha mirina serokhoz û beg û  
mîran ra  
digirt ko ew bi tundî diketin jêr kartêkirina gotinên wî; xeberên wî  
bi  
tundî li wan kar fikir. Ewî wisan bi ser û ber û bi hostatî xeberên  
xwe lev

232 BILÎCAN



dihanî, ko gotinên wî weke moriyekê dikete guçkên wan. Ewî  
gotinên  
xwe weke moriyan pê va dikir. Ewî zor caran bi hostatî li vê hunera  
xwe  
wêc verdigirt. Li kutaya gotinên xwe da gelek caran jî destê xwe  
dida  
peleguha xwe û stiranek yan li pesnê mazûvanê xwe da, yan jî li  
pesnê ax-  
ayekî dî da digot. Gelek caran li stiranên xwe da dihavîte reşê neyar  
û dil-  
nexwazên mazûvanê xwe. Pişka zore serokhoz û karbidestên gel tê  
dikoşîn ko bi dayîna xelatên zor giranbuha dilê Elo Begzade bikirin  
û ewî  
her dem li xwe razî ragirin.  
Elo û Delo begzade li ciyê ko Emer Axayî nîşanî wan dabû, rûniştin.  
Emer Axa bi lêvken berê xwe li ser Elo da kir û gotê:  
»Çi heye çî tune ye begzadê delal?«  
Elo begzade her bi pirsiyara Axayî ra dest bi pesn û pêhelagotina wî  
kir:  
»Axa yê me her dem serferaz û serbilind be! Begê me ji me û ji gelê  
me  
ra bijî! Bijî xanê xanan, axayê li ser axayan ra, bijî begê began! Bijî  
Emer  
Axa! Emer Axa em her bi nav û dengê te dijîn. Serê me her bi navê  
te  
bilind e. Em her li saya serê te da dijîn. Navê te ji me û ji gelê me ra  
hegera

serbilindî û şanaziyê ye. Li seranserî Kurdistanê da li ser te ra mêr  
nehatin  
û ne jî tên. Dayîka felekê jî êdî neşê mêrekî wekî te bîne. Mêranî û  
mêratî  
û axatî bila her li te pîroz be. Navê te li seranserî Kurdistanê da  
belaw  
bûye. Nav û dengê te li çar nîkarê Kurdistanê derbas bûye û belavî  
nav  
dinyayê bûye. Yek te, yek jî Mîrê Ereban, Mîr Elî Siwarani, we  
herduyan  
serê me li nava giştî gelên cîhanê da, li nava dost û dijminan da, li  
nava  
bîhanî û derekeyan da bilind kirine. Ca li we çêtir nebe, Mîr Elî  
Siwarani  
jî mêr li ser xwe ra nedîtiye. Mîrekî bi nav û deng e. Mîrekî ji xwe  
zêde ye.  
Hefthezar û heftsed malên kurd û ereb li jêr siya wî da dijîn. Lê  
mirov di-  
vê ko emekê şêran û mêran jî ji bîr neke. Rast e ko mîrê ereban nav  
li  
cîhanê da deranî ye û deng veda ye, lê giştî nav û deng û hêz û  
şiyana wî,  
berfirebûna kewşenê wî hemû li saya serê Hesê Dûdê û her heft  
kurên wî  
yên weke şêr û pilingên çeng bi xûn dabû. Hesê Dûdê mêrekî bilindî,  
çepildirêjî, navmilpanî, çûrî çavhêşîn bû. Ew pehlewaneke bi nav û  
deng

bû. Ewî bi mêranî û mêrxasiya xwe, bi zora milê xwe, bi hêza şûr û nêza xwe, çendik û çend pehlewanên rom û ereb û eceman li ser çokan êxis-tiye. Li saya serê Hesê Dûdê û her heft kurên wî da bû ko çendîn êlê Ereban, çend gund û bajarên romiyan bac û xeraca salane didane Mîrê ereban. Lê piştî wê hindê ko raza kuştina zavayê Hesêyi derkete eşk-eretiye, Hesê Dûdêyi êl li ser Mîrê bir kir û ji xwe ra êl û zomeyêke dî serast kir. Lê mixabin salek li ser ra derbas nebû, ko Hesê çû heqiya xwe.

233

BILÎCAN

Gelekan digotin Hesê bi pîlan ji holê rabû. Ya rastî Hesê êdî pîr bibû. Hesê berî mirina xwe, li rasipardeya seremergê da, sipartiye kurên xwe ko ne serî li ber Mîrê ereban danên û ne jî li dijî wî bilivin. Lê rasipardeya wî ya here giring ji kurên wî ra ew e bû ko li demên şeri da, gava ko bîhaniyekê hêrişî ser mala Mîrê ereban kir, şûrkêşiya Mîrê ereban bikin. Ca li ser rasipardeya Hesêyi ya seremergê, her gava ko talanekî mala Mîrê tê kişandinê, yan cerd davêje ser talanên wan, her heft kurên Hesê Dûdêyi xwe tev girê didin û li hawariya mala Mîrê da diçin. Talanan

dizivirînin û dîsan dizivirin mala xwe.

Ca axa yê min mala Mîrê Ereban bi nav tê gotinê. Maleke giran û pir zengîn e. Xûlên hêştirên wî, revoyên hespên wî, keriyên pezên wî, garanên dewarên wî der û deşt hilnade. Eger mirov zêr û zeyneta mala

Mîrê Ereban bike çeman, çemên li ber bimirçiqin. Lê ev giştî mal û heyî

û dar û nedarê Mîrê Ereban aliyekê ye, axa yê min, Bilîcan jî aliyekê ye.

Mirov dibêje Xudê mirov qet ne bixwe û ne vexwe hema li Bilîcanê binêre.

Emer Axayî xwe ranegirt û pirsî:

Begê delal Bilîcan çî ye? Navê qîza wî ye?

— Na, axa yê min! Te çawa navê Bilîcanê nebihîstiye!? Bilîcan mahîna

Mîrî ya taybetî ye. Bilîcan mahîneke şînbaz e. Xaleke sipî li ser gurçika wê

ya rastêye. Mahîn bînanî qîzeke xame ye. Heft meyter li berin. Rojê sê

caran Bilîcan tê tûmar kirinê. Bilîcan hind temîz e, kirasê wê difire nav

çavên mirovî. Eger mirov parçeyekî çiftexas li ser leşê wê bigerîne, parçe

leke nagre. Xarê Bilîcanê kakil û kuncî ye. Bilîcan tim û tim kiras kiriye.

Kirasê wê çarbask kirî ye. Lingên wê qeyd kiriye. Qeyda wê kilîd kirî ye.

Kilîda qeydê li ber pişta nebiya Mîrê ereban Kulîk xatûnê da ye.  
Tenê ro-  
jên eyniya ji bo ko mahîn xam nebe, ewê derdixin derva û digerînin.  
Rojê  
du caran Bilîcanê av didin. Ava wê bi hoqe û pêkêşkên taybetî  
didinê. Ev  
mahîna heft êlên Ereban li ber xeracên heft salan va dane Mîrê  
ereban.  
Bilîcan axa yê min yanê ji bilî can tu çî pê bidî tîne. Yanê ji bilî can  
hêjayî  
her tiştî ye. Lê ta roja îro gelean canê xwe li ser Bilîcanê dane.  
Hatine  
Bilîcanê bidizin, lê bi destên kurên Hesê Dûdêyî canê xwe li ser  
Bilîcanê  
ji dest dane. Ta roja îro gelek çete û cerde û serekcerdeyan canê  
xwe ji bo  
Bilîcanê ji dest dane. Hatine Bilîcanê bibin, lê hawariya kurên Hesê  
Dûdêyî pê ra giheştiye û Bilîcan ji nav dest û lepên wan deraniye.  
Mêrikan hema rastî jî mêrxas in. Gurên dev bixûn in. Mêvehêr in.  
Pehlewan in. Mêr li ser pozê xwe ra nedîtine û nabînin jî. A ,ji dilê  
min

## 234 BILÎCAN

ra xwazî roja îro mahînek weke Bilîcana Mîrê Ereban li ber derê te  
ba, ca  
hînga çî kêmasiyên mala te tunebû. Mala te yê hînga li ser mala  
Mîrê  
Ereban ra ba.

Emer Axayî jê pirsî :

Herê te negot, kê zavayê Hesê Dûdêyî kuştibû?

Axayê min çîroka wê dûr û dirêj e. Kurê Mîrê Ereban yê mezin  
Ehmed

beg dil ketibû, Werdeka qîza Hesê Dûdêyî, lê şivanê wan li se mercê  
Werdekê bi Werdekê ra guleş kir û Werdek ji hemûyê istand.  
Ehmed

Begî jî ji şivani ra tele danî û şivan kuşt û bixwe jî hate kuştinê.

Emer Axa û Neimetê Îsi li nav çavên hevdu nihêrîn. Bi van gotinane  
ra

Emer Axa kete ponijîna kûr û balinda hizrên dûr û dirêj ew ber bi  
êla

Mîrê Ereban û Bilîcanê û lawên Hesê Dûdê û lawên Werdekê  
rakişand.

Begzadan jî dest avîtin neyîka xwe û miqamekî bi şewat lêdan.  
Dengê

pirsoje neyîkê têkelî nav û dengê Mîrê Ereban û navê Bilîcanê û  
lawên

Hesê Dûdê û lawên Werdekê û têkeliya Kero û Perîşanê bûn û li nav  
serê

Emer Axayî da deng vedan û serê wî gêj kirin. Serêşiyeke tund bi  
Emer

Axayî girt.

Eyşanê ko ta niha li pişt perdê guhdariy axiftinên Elo Begzade dikir,  
li

pişt perdê derket û hate hundurê dîwanxanê û paşî serçavaniyê  
destê xwe

bire ber pişta xwe û qotiyêke zîvê kildayî li ber pişta xwe deranî.  
Devê

qotiyê vekir. Bo her begzadeyî zêrek deranî û gote wan zor sipas  
begzadên

delal dema xewa Axayî ya paşnîvro ye, eger gotinên we kuta bûbin,  
Axa

dixwaze hindekê vehese. Bi gotinên Eyşanê ra begzadan pese û  
pûsê xwe

berev kirin û xatirê xwe xwastin û ji dîwanxanê derketin. Neimet û  
Eyşan

jî xwe dane binmilê Emer Axayî û ew ber bi aliyê malê birin. Axa li  
ser

hemdê xwe nibû. Eyşanê cî û nivînê wî bi keniz û kulfetan da  
rêkxistin û

Axa danîne nav nivînan. Kenizan av û legenî anîn û Eyşanê lingên  
Axayî

kire nav avê û bixwe jî destmalek ter kir û danî ser eniya Axayî. Paşî  
de-

mekê Axayî çavên xwe vekirin û pirsî:

— Kanê begzade?

— Çûne nav êlê.

— Nav êla ko Kero li ser min bir kiriye. Êla ko kurê Werdo li ser min  
bir kiriye. Ew êla ?

Eyşanê destê Axayî kire nav destên xwe û li ber dilê wî va hat û ji bo  
wê

hindê ko dilê Axayî veke, jê ra stiranek weha got:

235

BILÎCAN

Axayo rabe ji xewê ye...  
Delalo rabe ji xewê ye...  
Derkeve ji nava nivînê ye...  
Vexo çayê û qawê ye...  
Apincî bavêje navmilê ye...  
Gîzma bikişîne binçokê ye...  
Milê xwe bide milê min zeriye ye...  
Bike serwêriya vê êlê ye...  
Êlê bêxayî nehêle li erdê ye...  
Li ber çî negre karê kurên di Werdê ye...  
Delalo rabe ji xewê ye...  
Axayo rabe ji xewê ye...  
Êlê bêxayî nehêle hîviya di xelkê ye...  
Axa li nav nivînan hilqedimî. Bi destmalê kujê çavên xwe paqij kir.  
Pala  
xwe da palgî û li bersiva Eyşanê da weha got:  
Eyşanê dilê min birîn e...  
Delalê dilê min birîn e...  
Serê dilê min bi kul û nava dilê min bi xwîn e  
Tu rabe li derva konê kurên Werdê bi çav bibîn e...  
Tu dibêjî mija asîmanan li rû zemîn e...  
Bûye serdarê êlê, êlê li bindestê xwe digerîn e.  
Tirsa min ji wê tirsê ye ko axatîyê ji min bistîne...  
Êdî buhayê min li ser rûyê vê cîhanê qet namîne ...  
Delalê dilê min birîn e...  
Eyşanê dilê min birîn e...  
Serê dilê min bi kul e, nava dilê min bi xwîn e...



Li dû stirana Axayî ra, vêca Eyşanê destê xwe da bin peleguha kever  
û ji  
dilê xwe ra weha qîr kirê:  
Axayo rabe ji xewê ye...  
Delalo rabe ji xewê ye...  
Vexwe çayê û di qawê ye...  
Bikişîne nexşe û pîlanê ye...  
Lêxe duhola hawarê ye...  
Sed û bêst û pênc pehlewanan bîne aliyê dîwanê ye...  
Fîncana feyfûrî danê li ser zerfê ye...

### 236 BILÎCAN

Zerfê danê li ser telbê ye...  
Telbê danê li ser masê ye...  
Bêje her kê here beriya Şengarê ye...  
Ji min ra bîne Bilîcanê bi zora darê dar rimê ye...  
Ezê bidemê Perîşana qîza xwe bi helaliya Xudêye...  
Her dû kurên Werdê bixapîne, bînanî rûviyan têke di telê ye...  
Bi gef bişîne ser êla malxalê ye...  
Çûyîn li dest wan e, hatin di dest Xudê ye...  
Bila herin rêka hat, nehata vê qedê ye...  
Bila konê wan bimîne hîviya di xelkê ye...  
Vêca Eyşanê devkî weha ji Emer Axayî ra got:  
— Min giştî gotinên begzadeyan gudarî kir. Ezê teleyek wisan ji Ker  
û  
Kuliki ra venêm ko wisan herin, hindek bêjin hebûn û hindek bêjin  
qet  
tunebûn. Bila wisan tîl herin, qet kes çîroka wan jî venegêre.

Neimetê Îsi guçkên xwe biliqand û berî Axayî pirsî:

— Çawa xalojinê?

— Hûn dizanin ko Ker bûye evîndarê Perîşanê. Ew li evîna Perîşanê da

dişewite. Dibêjin hindî çûye, li qiracê hanê daniye, tebata wî bona Perîşanê tune ye. Êdî nêçîr û nêçîrgeh hemû ji bîr kiriye. Bînanî qîza kor

ketiye bin çatorê xwe û şev û roj diponije. Roj bi roj zer û zerhimî dibe.

Şev û roj xew li çavan nakeve. Ezê ji wî ra pîlaneke wisan bikişînim ko ew

here û neyê. Kero li seb xatirê Perîşanê amade ye, serê birayê xwe jî bibire.

Emê li duhola hawarê bidin. Bila tewawî giregire û serekhoz û bokeber-

an û mêrxas û pehlewên heşt bavên Kurmancan li dîwanxanê da berev

bibin. Emê qaweya mercan bidin kelandinê û bêjin her kesê ko vê qawê

vexwe, yê here beriya Şengare Bilîcana Mîrê Ereban, bi şer û mêranî, bi

zora darê dar rîman bîne û emê qîza xwe Perîşanê bi helaliya xwedê bid-

inê. Ca hemîn çi kes li tîrsa lawên Hesê Dûdêyî da newêrin. Kê dixwaze

bi destên xwe, xwe bide kuştinê. Tenê Kerro ye ko evîndar e. Evîndar li

merg û mirina xwe natirsin. Kerro yê were û fîncana qaweya  
mercan

hilîne û yê here û neyê. Ca gava ko ew çûn û nehatin. Êla ko xwe  
dane ser

wan jî yan yê bên û bigîjin me, yan jî dê jev bibijiqin. Ca hînga jî dilê  
me

ji kê ra xwast, emê qîza xwe bidinê.

Emer Axa li nav hişê xwe da çû. Kûr ponijî. Te digot qay ji xeweke  
gi-

ran radibe, li nav nivînan derket. Nîveka çavên Eyşanê ramûsî û  
gotê:

Tele ji vê telê baştir nabin. Lê emê bêjin ko çunku Mîrê Ereban bi  
dex-

237

BILÎCAN

esî Silêmanê Silêv biraziyê Îsê mîrî kuştiye, em jî dixwazin ko  
lekeyekî

lêdin û tola xwe ji wî vekin. Hînga gava ko navê bavê wan li ber guhê  
wan

bikeve û bibihên ko xelk dixwazin herin li dewsa wan tola bavê wan  
vekin, lap yê bêne coşê û hişê di serê wan da nemîne û yê herin  
heyfa ba-

vo û dadê jî danên ser. Lê tişteke giring heye. Debê ko em Werdekê  
ji

wan biqetînin. Ta Werdek li bal wan be, ew naxapin. Rêka wê jî ez  
dizan-

im. Vêca berê xwe li ser Neimeti da kir û gotê:

Neimet tu yê sibê herî mala meta xwe Rewşê. Ji rewşê ra bêje ko Mamê

Îsi ez şandime. Gotiye bila çend rojan Werdekê gazî bike mêvandarî. Bêjê Îsê gotiye bila Werdekê serwext bike, ko nehêle kurên wê li ser şirî-

ta dijmini bileyze. Em berê da xizmên hev in. Kurên Werdekê li xeber-

daniya wê dernakevin. Eger Werdek dil bike, dikare wan bîne rê. Eger

Werdek hez bike, Emer Axa dîsan jî dixwaze mala wan bîne û bigehîne

xwe. Ya êlbirkirinê jî jê ra bêje! Ji bîra te neçe ha bêjê Îsê ez şandime. Sibê

zû here li Caniya Xezalê siwar bibe û here. He ezê ewê caniyê bidim te.

Ew caniya ji te ra.

238 BILÎCAN

31

Hê steyr li esmanan hebû ko Neimetê Îsi li Caniya Xezalê siwar bû û berê

caniyê da zozanên Sardewaran. Yekbîn dajot û dikudand. Caniya Xezalê

li ser herd û berd û kor û kendalan ra banz dida. Dil hebû fir bida. Bînanî

bayê bezê diçû. Toz û dûman li ser rê xistibû. Toza li ber piyên wê bînanî

hêlekê li hewale, li ser sîngê asimanî ra dihate kişandinê. Caniya  
xezal  
caniya Emer Axayî ya taybetî bû. Emer Axa li şayî û bereviyên dîwanî  
da  
li wê siwar dibû. Wî Caniya Xezalê ji nefsa xwe ra dida xudan kirinê.  
Navê Emer Axayî li ser Caniya Xezalê bû. Sê çar meyster li ber Caniya  
Xezalê bûn. Ta roja îro ji bilî Emer Axayî çî kesî piyên xwe neavîtibû  
ser  
piştta wê. Lê îro waye, Neimetê Îs, kûsela pîs li Caniya Xezalê siwar  
bibû.  
Kûsela pîs zêdenavê Neimetê Îsi bû. Dema ko Neimet biçûk bû,  
heval û  
hevtemenên wî ev navnûçika lê kiribûn. Dema ko kûşkê li Neimeti  
biêşiyana, digotonê; Neimetê Îs, kûsela pîs. Vêca gava ko Neimeti  
ev  
navnûçikana dibihîst, xwe li erdê digevizand. Dil hebû zikê xwe  
bidiran-  
da. Lê zaro yek û du nebûn, komek bûn. Îca li demên weha da zaro  
dibûne du desteyan deng didane hevdu. Desteyekê digotin;  
Neimetê Îs.  
Desta dî digotin; Kûsela pîs. Li ber koma zaroyan çî ji destê Neimeti  
nedihat. Tenê dikarî ji destên zaroyan xwe li erde vegevizîne. Lê  
dayîka  
wî, Xecîc Xatûn, xûşka Emer Axayî li zaroyan derdiket. Bi hatina  
Xecîc  
Xatûnê ra her zaroyek li aliyekî da direvîn û Neimet tenê dima. Lê  
êdî

Neimet ne ew Neimeta ye. Bûye şêvirdarê taybete Emer Axayî.  
Girtin û

berdana nivê dîwanxanê li destê wî da ye.

Erê îro yekimîn care ko Caniya Xezal, ji bilî Emer Axayî Siwarekî dî li  
ser piştta xwe dibîne. Caniyê pêşda dizgîn neda Neimeti. Lê Neimeti  
xwe

îşkeîşk bi qaşa zînî va girt û ew du seriyên hevraz û berjêr bezand û  
dax-

iste terqa rê û da xaran, dakû berebere leşê caniyê germ bû û berê  
guhên

wê xuyî dan û hêdî hêdî êm bû.

Erê vaye Neimetê Îsi li Caniya Xezalê siwar bûye û ewê bi dilê xwe  
ra

dibezîne. Dide xarana. Êdî Caniyê Xezalê bûye caniya wî. Li dilê xwe  
da

dibêje:

239

BILÎCAN

He dem hatiye. He van rojana xalo çawa Caniyê Xezalê daye min, yê  
wisnê jî rojekê li kerba kurên Werdo da, bêje: Neimetê delal here  
min

Perîşan jî da te.

Bîr û hizr e. Bêdawa û xurayî ye. Ne kes bêşa bîr û hizran li mirovî  
dixwaze, ne jî kes dikare berayîka hizirîna mirovî bigire. Neimet jî  
waye

ji xwe ra li cîhana bîr û hizran da, bêtune û bêdawa li Perîşanê dibe  
xu-

dan. Li ber evîna yekaliya xwe û Perîşanê li cîhana bîr û hizran da,  
west-  
an û mandîbûn nakeve bîra Neimeti. Dajo û dikudîne. Li nav serê  
xwe  
da nexşeyên cur be cur dikişîne. Ker û Kuliki dide kuştinê. Paşê li  
Perîşanê dibe xudan. Li dû ra dilê wî bi Werdekê jî dişewite.  
Jinmama  
xwe jî, ji bo wê hindê ko bêxayî û xudan nemîne hîviya xelkê va, li  
xwe  
mare dike. Çi bend û girê li serê rêka wî tune ye. Li dîne îslamê da,  
her  
mêrek dikare çar jinan mare bike. Di gavekî da bibe xudanê çar  
jinan.  
Neimet jî mêr e. Ma Neimet ji mêrên dî kurt û kêmbertir e. Ew jî  
dikare  
bibe mêrê çar jinan.  
A, bîr û hizir bê kewşen û bê sînor in. Hizir li ser her bend û her sînorî  
ra banz dide. Pirika hizirîne dikare li çavgirtinekê da giştî topa  
cîhanê lev  
bide, per lêde û seranserî cîhanê li jêr per û baskên xwe ra derbas  
bike. Li  
ser her sînorên dirikdar ra difire û diçe wî alî dirik û bor û bendan.  
Neimet pêş da Perîşan dixwast û paşê jî Werdek dihanî û didanî ber  
mala xwe. Ewî Perîşan bi heyte û hût, bi duhol û zurna li der mala  
xwe  
peya dikir. Perîşan li cil û bergên bûkîniyê da li pêşber xwe didît.  
Xwe û

Perîşan tenê li pişt perda bûk û zavatiyê da dît. Vêca devê xwe dikire hi-

narkên rûyan.

Neimet li nav van hizr û bîrana da, bînanî bayê bezê dajot û dikudand.

Hê siya êvarê baş danegeriyabû, taze berodanên zomê digehîştin nav

malan, ko Neimetê Îs Siwarê caniya Xezalê, xwe gîhande zozanên Sardewaran.

Naweya nîveka zozanên Berdezêran, zozanên Emer Axayî ta zozanên

Sardewaran, siwarî rêya roj û danekê bû. Lê Neimetê Îsi li evîna Perîşanê

û xazîka siwariya caniya Xezalê da, per deranîbî. Bibû firinde û ew naweya li danekî rojê da pîvabû.

Neimet hînga serê xwe li nav dêl û bijiyên caniya Xezalê da deranî, ko

xwe li himber êleke reş û giran da dît, konên reşe erebî li pêşîra çiyayekî

bilindî serkever da mil kutabûn hev. Te digot qay çiyayi kolozê kal û ba-

van daye serê xwe û koloz ta ser birû û bijangan daxistiye. Her alî xoşîna

avên çem û kanî û cok û cobaran bûn. Xuşîna avê tevî dengê bilûrê bilûr-

240 BILÎCAN



vanan dibû û nalenale dikire dilê çiya û zang û zaxeyan. Çendîn zomeyan

li nêzîkî hev danîbûn, konan deste deste li pêşîra çiyân da mil kutabûn

hev. Hebin avîtibûn hebinan, kon zor û zewend, mişe û gelek bînanî stêrên asîmani û xîzên rûbaran xezelên xezelwerê bûn. Her alî zome bûn

ko li rex hevdu hatibûn vegirtinê. Zome nedihatin hejmarê. Çavên mirovî li ber pirbûna konan reş û tarî dibû. Neimet nizanî yê here kîjan

zomeyê. Eva cara yekê bû, ko ew dihate zozanên Sardewaran. Her tişt ji

wî ra taze bû. Li biniye konan rastî peyayekî hat. Paşî silav û serçawaniyê

jê pirsî:

Erê bira pirsiyar bêxewş e, zoma mala Husên Paşa kîjane?

Peya bi hejiyareya tipila xwe zoma here jorîn nîşanî wî da û gotê:

A, ewa hane serper, ewa ko li ser kaniya Teyrokê daniye, ew zoma mala

Husên Paşayi ye.

Neimeti ber bi wê zomê hajot. Husên Paşa, mêrê meta wî, Rewşê xatûnê bû. Neimet ji zomeya yekê bihorî û gihîşte zoma dûyê.

Caniya

Xezalê li xûyê da sipî çîl dikir. Her çend ko ew cara yekê bû, Neimet di-

hate wê zomê, lê ewî rast hajote ber derê mala Husên Paşayî. Lew ra ko

ewî dizanî, mala serekzomeyan tim li serê jorê didanên û konên  
wan jî ji  
giştî konên dî mezintir e. Li ber derê konekî reşî giran li caniya  
Xezalê  
peya bû. Meyteran serê hespa wî ra girtin û qasekê hespa wî li ber  
derê  
konî hevraz û berjêr gerandin. Jinek navsalî, lê bi gêre û vêre, bi  
xeml û  
xişl û rihel ji konî derket û ber bi mêvani hat. Gava ko jinikê nêzîkî  
bi wî  
kir, ew nasî û got:  
Ay! Eve Neimete!  
Îca bi gotina xwe ra hate bal Neimeti û destên xwe li uskura wî ra  
bir  
mirçemirç çû rûyê wî. Neimeti jî destê wê kire devê xwe û maç kir.  
Rewşê  
pêş Neimeti ket û ew bire xîveta xwe. Pirs û pirsiyaran dest pê kirin:  
— Dey Neimet tu li ser serê meta xwe ra hatî.  
— Zor sipas! Ez destên te radimûsim.  
— Dayîka te û bavê te wan, êl û zome û xizm û kes û kar hemû  
başin?  
— Erê sipas ji yezdani ra, hamû başin. Bavo û dadê jî hemûyê tu  
silav  
dikirin.  
— Ser seran û ser çavan. Silav ji yên ko şandiye û ji yê ko înaye ra jî.  
Dey  
bêje Neimet, gurgên kîj çiyayî mirin ko te meta xwe kiriye bîra xwe  
û tu

hatî sera me? Xo nihêranî çineye?

— Na ciyê çi nihêraniyê çinîne. Hemû baş in.

Lêre da Neimeti tûka xwe qurt va kir û serê xwe berda.

241

BILÎCAN

Meta wî lê kete gumanan û pirsî:

— Ya rast bêje ha, ka çi neqewimiye?

— Na, çi neqewimiye, lê...

— Lê çi? Te ziravê min qetand. Bêje ka çi heye?

— Xudê tişteke hind giring tune ye, lê eva demaneke ko herdu kurapên

min, Ker û Kuliki alozî kirine nava êlê da ?

— Aloziya çi?

— Xudê herdu kurapên min, êl li ser xalo bir kirine. Niha nêzîkiya hezar malî li êla xalo cuda bûne û xwe dane ser Ker û Kuliki. Ker û Kuliki

jî bi hewayaya wan malan niha karê şerê mala xalo dikin. Kerrî gotiye, ezê

axatiyê ji Emer Axayî bistînim. Axatî her berê da ber para mala me ketî

ye. Ca niha hema herdu deste jî li ber hev teliyan e. Em jî mane li nîveka

nal û bizmaran da. Hevraz mêze dikin simbêl e, berjêr mêze dikin rû ye.

Li tayê Ker û Kuliki biaxivin, Emer Axa li me sil dibe. Li tayê Emer Axayî

biaxivin, Ker û Kuliki dibêjin hûn pişta xizmê xwe digirin. Bavo ez

şandim. Got meta xwe gelekî silav bike û bêjê, bila Werdekê gazî  
bike û  
li wê derê ew û Husên Paşa li ber Werdekê bixûnin û belkî Werdekê  
ser-  
wext dikin, da ko kurên Werdekê wan keviran li pêşa xwe davêjin.  
Bavo  
her çend kir û nekir kesî bi gotina wî nekir. Niha bavo li herdu layan  
jî sil  
bûye. Bavo digot li bextê we û Xudê dame, zû dest hilînin û nehêlin  
ev  
şerê hanê biqewime. Şerê xwe bi xwetiye rîşa kotîbûnê ye. Bila  
Werdekê  
bibin û li wê derê ewê serwext bikin û avekî li ser vî agirî da bikin.  
Rastî  
jî eger şerek biqewime çemê xûnê yê bikişe. He rastî em jî her li  
hewale  
mane. Em nizanin ka emê çi bikin. Piştî Emer Axayî bigirin, xelkê  
kevi-  
ran dane ser pêşa me. Piştî Ker û Kuliki bigirin, nabe. He rastî em  
ho  
dikin dê dimire, ha dikin bav dimire.  
Rewşê serê xwe bi wateyê derdedariyê hejand û got:  
»Lawo eger xudatî be, Ker û Kulik mafdar in. Çavên min ji Elî û  
Silêmanê bêmiraz ra birije! Ker û Kulik rast dibêjin. Axatî her berê  
da ya  
mala bavê min bû. Lawo tu gencî nayê bîra te. Kuştina Elî hema  
bînanî  
niha tê bîr min. Elî bi pîlan hate kuştinê.«

Bi anîna navê Elî ra keserka kûr kişand û hêsireke zirav li çavên wê hat

û li ser rûmetê wê da xingilî. Pê kujê xavika xwe çavê xwe paqij kir û got-  
inên xwe domand.

»Lawo axatî berê di destê mala me da bû. Çîroka wê dirêje. Piştî miri-

na bavo û kuştina Elî, xalê te çû dîwana dewletê û axatî zivirande ser navê

xwe. Lê êdî derbas bûye. Niha komek kulfetê me û Emer Axayî di nav

242 BILÎCAN

hev da heye. Xûna me têkelî hev bûye. Xudê pakiya min ji çi kesî tune ye.

Eger ev xizminatiya me neba, seb xatirê vê xizminatiyê neba, minê bixwe

jî piştî lawên Silêmanî bigirta. Minê bigota bila Husên Paşa li dîwana

dewletê da jî, li ser karê wan bixebitiya û qeyd û qoçanên wan deraniya.

Lê ez çi bikim. Evê xizminatiyê destên min girêdaye. Per û baskên min jê

kiriye. Nahêle ez bifirim. Neimet lawo! bila dilê te ji min nemîne. Xudê

kem Ker û Kuliki çi bikin jî mafê wan heye. Lê ez qirika dêran nikarim li

xebardaniya Îsê jî derkevîm. Bila be, lawo ezê êvarê bêjim Husên Paşa, bi-  
la çend siwaran bişîne û Werdekê bîne. Şerê xwe bi xwetiye, mala me  
hemûye kavi û wêran kiriye. Gereke em hemû li hindav xwe da bi her  
cureyê ko ji destê me tê pêşayîka şerê xwe bi xwetiye, vê rîşala kotîbûnê bi-  
girin. Debê em hemû sererayî giştî kar û destvehatên cîhanê, rîşala şerê  
xwe bi xwetiye ji binê va hilqetînin...«  
Li vê naveyê da kiçkek siniyeke qawê li ser destan hate hundur.  
Hulmek germ û sivik ji qawê quloz dibû. Kiçkê pêş da sinê li ber Rewşê û  
li dû ra jî li ber Neimeti girt. Neimet û Rewşê qaweya xwe li bédengiyê  
da vexwarin. Li dû ra Rewşê rabû û gote Neimeti:  
»Tu rabe here dîwanê! Ezê her tiştî cî bi cî bikim. Hindî ji destên min bê ez nahêlim şerê xwe bi xwetiye bikeve nava me Kurdan da.«

243

BILÎCAN

32

Pîlana Emer Axa û Eyşê û Neimeti jê girt. Ewan Werdek ji lawên Silêmanê qetandin. Werdek li serê rêya wan da bendeke giran û kevirê  
mezin bû. Niha ew kevirê giran û ew benda bitew li serê rêya wan hatibû

rakirinê. Vêca ewan dikarîn bi sanahî nexşeyên xwe bi kar bînin. Bi nexşe

û pîlanan Ker û Kuliki li serê rêya xwe rakin. Ewanê ko êl li ser wan bir

kiribûn, wanên ko destdirêjîyî namûsa wan kiribûn û li hemûyê giringtir

wanên ko dawa axatîyê kiribûn, gereke ji holê bihatana rakirinê. Gereke

li ser topa vê cîhana xapxapok rabana. Li ber çavên Emer Axayî wenda

bibana.

Vaye Emer Axa û Eyşê û Neimet tenê li xîveta taybetî da şêvir danîne.

Şêvir giran kirine. Ro dikin û dipîvin. Giştî rêkên ji holê rakirina wan vediçirin. Piştî got û bêjeke dûr û dirêj Emer Axayî serê xwe bilind kir û

bi du denga gazî kir:

»Kuro Hevrê!«

Bû repetepa lingên Hevrê û li ber derê xîvetê rawesta û got:

»Ez benî fermo!«

— Here gazî Mîrza Qadirî bike!

Hevrê qawegerînê xîveta Emer Axayî ya taybetî bû. Her wisan ew peyayê hawarî û gaziyan bû. Li kî derê karekî bi lez heba, ew dişandinê.

Ji Hevrê ra digotin peyayê sivik.

Bi gotina Emer Axayî ra Hevrê li ber derê xîvetê ber bi mala Mîrza Qadirî helat. Li demeke kurt da, Hevrê û Mîrza Qadir tev giheştin xîve-

ta taybetî. Mîrza Qadirî silav da rûniştîyên xîvetê û bi hejjiyareya Emer

Axayî ra li pêşberî wan rûnişt. Piştî silav û serçavaniyê, Emer Axayî got:

»Mîrza Qadir nameyekê ji tewawî giregire û mêrxas û pehlewan û xoşmêr û bokeberanên her heşt hozên; Kîkan, Mîlan, Zîlan, Sîpikan, Mirdêsiyan, Şadikan, Reşkotan û Silîvan ra binivîse. Bila hemû roja çarê

mehê li dîwanxanê da top bibin. Binivîse berevî bereviyeke zor giring û

dîwaniye.«

Li dû gotinên Emer Axayî ra Mîrza Qadirî qumqumkê cohera xwe

244 BILÎCAN

danî ber xwe. Qelem û kaxetên xwe deranî û devê qumqumkî vekir û bû

çîreçîra qelema wî li ser kaxetan geriya.

Eva çar şev û çar roj in, ko Mîrza Qadir li ser çokan rûniştîye û nameyan dinivîse. Ew her nama ko dinivîse, carekê dixûne. Li dû ra mohra Emer Axayî li binê namê dide. Nameyan weke nivîştan li ser hev

da sêniçik qet dike û dide destê Emer Axayî.

Evan ji mêrxasên êla Zîlan ra hatine nivîsînê.

Evan jî bo pehlewanên êla Şadikan e.

Evan jî yên bokeberanên êla Sîpikan e...

Peyak û teterên sivik li ber derê dîwanxanê rawestan e. Emer Axa bi



xwe nameyan yek bi yek dide destên wan û wana ber bi êl û hozên ko

Mîrza Qadirî name bo wan nivîsiye, dişîne. Peyak û teter nameyên nivîstî li ber qetê kum û koloz û şeir û rişiyên da dadînin û her yek dikevin rêyekê û her yek li aliyekî da diçin. Her yek berê xwe didin êl û

zome û hoz û tîre û malbat û bavikekê. Li kê derê mêrxasek heye, kubkubeyek heye, bokeberanek heye, pehlewanekek heye, Emer Axa ji wan

ra nameyan dişîne.

Di gel namenivîsîna Mîrza Qadirî ra, Emer Axa gazî Êxoyê file kir û gotê:

»Êxo were vira!«

— Belê ezbenî!

Êxo li binêşe û bereya xwe da Ermenî bû. Ew her li zarotiya xwe da, li

nav mala Emer Axayî da mezin bibû. Êxo hem dengbêjê dîwanxana Emer Axayî bû, hem jî hosta û bînekêşê êlê bû. Êxo çek û rext , tîr û ke-

wan, nêze û sîngî, şûr û xencerê êlê çê dikir. Vêca her kê bixwasta, Êxo

navê wan jî li ser tetika çeka wan dinitiland. Yan jî eger bixwastana, Êxo

biyên wan, yan jî bîneyên hezkirî û dilberên wan li ser tetika şûr, xencer

yan jî nêza wan dinitiland. Êxo bînekêşekî kirarî û hostayekî bêhevta bû.

Gava ko dilê wî bixwasta, bîneya mirovî wisan dikişand, ko li gel mirovî

mû lê nedida. Lê wakî dilê wî ji yekî ra nexwasta, devê bîneyê xwar dik-

işand. Yan jî çavekî bîneyê şaş dikir.

Emer Axayî fîncaneke feyfûrî, di gel telbeyeke zêr da destê Êxoyî û gotê:

»Bîneya Perîşanê li ser herduyan baş bikişîne!«

Êxo fîncan û telbe ji destê Emer Axayî vergirt û kelmelên xwe yê bînekêşanê helgirt û çû li ser kaniya biniya malan li ber tavê rûnişt.

Pêş da

pê qelema xwe ya pola bîneya Perîşanê li ser telbeya zêrî nitiland.

Li dû ra

torbe û tûrik û debikên rengan di gel pirçeyên cur be cur li ber xwe rêz kir

245

BILÎCAN

û bîneya Perîşanê li ser herdu aliyên fîncanê da kişand. Êxo wisan bîne

ciwan kişandibû, kê dîna xwe didayê, devê wan vekirî dima. Te digot qay

hema Perîşan bixwe ye, ko li ser dîwarê fîncana feyfûrî destê xwe daye

newqa xwe û xwe ra qudequde li wê derê rûniştiye.

Vêca bi fermana Emer Axayî fîncan danîn ser payê, paye danîn ser tel-

bê, telbe danîn ser masê û mase danine nîveka dîwanxanê. Mirovî ko we-

ha li fîncanê mêze fikir, mirov hizir fikir ko Perîşan bixwe ye, waye li

nîveka dîwanxanê da li ser masê rûniştiye.

Roja çarê mehê hê taze tav tijî cîhanê dibû, ko Emer Axayî gazî Êso û

Edoyê begzade kir û gote wan:

»Begzadên delal xwe bidin girê pêş malan û li duhola hawarê bidin!«

Bi gotina Emer Axayî ra her du begzadên dîwanê xwe dane girê pêşberî

malan û bi miqamê hawarê ringandin duhol û zirçandin zurnayê. Bi dengê duhol û zurnaya hawarê ra li her alî mirovan siwar û peya, berên

xwe dane dîwanxana Emer Axayî. Hawarî bû. Gazî bû. Hengame û ox-

ilme bû. Te xwalî bavîta, li ber mirovan nedikete erdê. Her kes têdikoşî

berî yên dî xwe bi derê dîwanxaneyê ra bigihîne û li ber çavên Emer Axayî

xwe şirîn bike. Komel bi tevayî li ber derê mala Emer Axayî kom bûn. Li

dû komelê ra bû şingîna siwaran. Pehlewan û bokeberanên heşt hozên gi-

ran yek li dû yê dî ra li dîwanxana Emer Axayî da berevî ser hev bûn. Berebere dîwanxane li egîd û pehlewan û xoşmêr û kubkûbe û serokhoz

û bokeberanan pingirî. Dîwanxane wisan tijî bû, ko derzî li ber mêvanan

nedikete erdê.

Emer Axa weke caran li serê jorê li ser doşeka xwe ya taybetî, bi palgî û

berpal rûniştiye. Gava ko dîna xwe dayê vaye êdî li dîwanxanê da ciyê

rûniştinê nemaye, ciyê xwe guhest. Du sê caran kuxiya. Dengê xwe xoş û

sîngê xwe paqij kir û berê xwe li ser koma pehlewana û xoşmêran da kir û

got:

»Gelî komela hêja, gelî pehlewana û egîd û xoşmêrên xoşewîst! Gelo hûn dizanin ko min çima ev mêvandariya giran daniye? Ev duhola hawarê ya çî ye?«

Deng ji çî kesî derneket.

Emer Axayî dû gotinên xwe ra girt û got:

»Bêy gotin niha we hemûyê jî navê Eliyê Siwarani bihîstiye.«

Gimegim kete nav dîwanê. Dengedeng û gotegot tevî hev bûn.

Deng

li hevdu siwar bûn û wateya erêniyê ji giştî dengan dihat.

Emer Axayî dengê xwe bilind kir û got:

246 BILÎCAN

»Gelo hûn hemû dizanin ko eva demanê çend salan e, Eliyê siwarani pismamê me Silêmanê Silîv Begî ko ji mamê Îsi xeyîdîbû û çûbû gi-hîştîbû wî, bi dexesî daye kuştinê û li ser da jî çend gund û navçên ko berê

li jêr destê me da bû, zorpes kiriye. Min jê ra peyama aşitiyê rê kiribû. Lê

li bersiva peyama min da gotiye, her çî ji destên wî tê bila xwe jê nehêvişîne.

Eva bersiva Eliyê Siwarani li himber peyama min ya aşitiyê daye. Ew roja îro bi her heft kurên Hesê Dûdêyî difire...«

Gava ko navê her heft kurên Hesê Dûdêyî hat, dîsan komela di hundurê dîwanxanê da weke deriyayekê hurmicî. Kêye ko navê lawên Hesê

Dûdêyî nebihîstibe!?

Emer Axayî kûşkê teqla dengê xwe bilind kir. Li dengê wî da rehên tûretiyê bi eşkeretî diyar bûn:

»Ez ewê yekê ji wî ra nahêlim. Ez roja îro divê ko li ciyê wê bersiva wî

da lekeyekê li wî bidim. Divê ez kepê wî bidim mizdanê. Bila êdî vir û şûn

da hizrên wisan nekeve serê kesekî dî û çî kes pê li guçkên xwe neke.«

Li dû ra kûşkê teqla dengê Emer Axayî nizim bû. Bînanî tiştê ko şermê

lê dest dabe, rengê wî soromoro bû û destê xwe li ser wê maseya ko fîn-

cana feyfûrî li ser bû, dirêj kir û got:

»Hûn hemû dizanin qîzeke min heye, navê wê Perîşane.«

Gava ko navê Perîşanê hat, bokeberan û mêrxasan xwe gij kirin. Ciyên

xwe guhestin. Kolozên xwe li serê xwe da edilandin. Rişiyên şeirên xwe

badan û li ser kostekên demhejmêran da berdan. Kumên xwe tele danîn.

Simbêlên xwe badan. Xwe pir kirin. Xewxewkên xwe daxistin.

Devên

xwe beş kirin.

Emer Axayî li nava birû û bijangan da avirek da komelê û dîsan gotinên

xwe domand:

»Belê hûn hemû wê fîncana feyfûrî ko bîneya Perîşanê li ser hatiye kişandinê dibînin. Ew fîncana ya qaweya mercê ye.«

Hemûyan çavên xwe kutane fîncana feyfûrî. Lê hê kesî nizanî kanê Emer Axa yê çî bêje.

Emer Axayî kûşkê dengê xwe bilindtir kir. Serî hemû li ser wî da zivirîn:

»Hûn hemû dizanin, ko Eliyê Siwarani mîrekî pir dewlemend û zengîn

e. Lê dibêjin mahîneke wî heye ko navê wê Bilîcan e. Giştî dar û nedarên

wî aliyekê ye û ew mahîna wî jî aliyekê. Her kes ji we xoşmêran îro li vê

dîwanê da, qaweya mercê li fîncana feyfûrî da vexwe, yê here li beriya

Şengarê bi zora şûr û nêzeyê xwe, bi şer û lêdan, ne ko bi reşedizî, Bilîcana

247

BILÎCAN

Mîrê Ereban li nav çeng û lepên her heft kurên Hesê Dûdêyî da, ko

mêrikan her rastî jî pehlewanên qerah û xûnxwarin, derîne û ji min  
ra  
bîne, ezê Perîşana Qîza xwe bi helaliya Xudê bidemê.«  
Emer Axayî gava ko navê kurên Hesê Dûdêyî îna, qestîka pesnê wan  
kir û xwest, ewanên ko navê Perîşanê hişê wan revandiye, bila  
bizanin  
kanê yê ji bo anîna Bilîcanê di gel kê rûberû bibin û şerê kê bikin.  
Gava ko navê lawên Hesê Dûdêyî hat, pûrta serê pehlewan û  
xoşmêrên  
dîwanxana Emer Axayî bîzbîzî bû û li koloz û kumên wan ra avît.  
Gurzî  
li leşên wan ra çû. Dilê wan lerizî. Lawên Hesê Dûdêyî bi nav dihatin  
gotinê. Wan bi mêrxasî û pehlewanî û xûnxoriya xwe va li seranserî  
Kurdistanê da deng vedabûn. Ta wê rojê çî kesî navekî wisan dest  
nex-  
istibû. Navê wan dilê her pehlewan û biwêrî dilerizand. Çî kesî li  
tirsan  
wan da nediwêrî, aviran bide ser beriya Şengarê.  
Emer Axayî li dû qisedana xwe ra bi çav û birûyan hejiyare da  
qawegerî-  
nan, ko qaweya mercan bigerînin.  
Qawegerînan fîncana feyfûrî tijî qaweya zengî kirin. Fîncan danîne  
ser  
payeya zîvîn, payeya zîvîn danîne ser telbeya zêrîn û li berekê da li  
serê  
dîwanê ta binê dîwanê qawe gerandin. Lê li tirsan lawên Hesê Dûdêyî  
da

çi kesî avir jî neda fîncana feyfûrî û heylo newêrîn li bîneya Perîşanê  
jî  
binêrin. Bîneya Perîşanê li pêş çavên wan bibû ziyayekî û devê xwe  
jev  
vekiribû, dil hebû ewan daqurtanda.  
Ew heft şev û heft roj bû ko li ber derê dîwanxana Emer Axayî du  
destan duhol û zurna dikutan û lêdidan. Ew heft şev û heft roj bû  
ko  
aşpêjan rojê sî, çil beranxes û dirmaz li nav kerîyan dihanîn û ji  
mêvanan  
ra ser jê dikirin. Ew heft şev û heft roj bû ko qawegerînan li dû hev  
ra  
qawa mercan li dîwanxanê da digerandin, lê çi kesî avir jî nedida  
fîncanê.  
Emer Axa li rûva pir nerehet û aloz bibû, lê li bin va, li binê dilê xwe  
da  
zor keyfxoş bû ko çi kesî fîncana qaweya mercan hilnedaye û fîncan  
hîviya xudanî va maye. Pîlana wî hêdî hêdî lê digirt. Gava ko  
qawegerî-  
nan qawe digerandin, giştî bokeberanan serê xwe dikirin ber xwe.  
Kolozên wan dikete nava birû û bijangan. Dest davîtinê xwe di qelûn  
û  
qederên xwe da dixapandin. Li ber şerman xûyî didan û li xûyê da  
reş  
dibûn. Hemûyê kep daxistibû ser simbêlan. Hundurê konî li ber  
dûkela  
qelûnan û hulma xûyê reş û tarî bibû. Hulmê û dûkelê bînanî  
boriyên



sobeyan li qelş û qet û derê konî ra dikişiya hewa. Bokeberanan li ber

nerehetiyê xwe vî alî wî alî difirikandin û xwe li ser konî da davîtin.

Dibû

çirteçirta hebinê konî û carê aliyekî hebinê konî diqetiya. Deh dandeh

248 BILÎCAN

kesan hema xwe dabûne ber konî û paşbend û pêşbendên konî dişindandin û hebinên qetiyayî girêdidan.

Piştî heft şev û heft rojan qawegerînan mizgînî dane Perîşanê û gotinê:

»Li tirsaw lawên Hesê Dûdêyî da kes nawêre aviran jî bide fîncana feyfûrî. Bêje Eyşan xanimê bila bêje Emer Axayî bişînin peyê Kerrî.

Ma

ko Ker bê û fîncanê ji destê me vegire. Milên me qerimîn, hindî ko fîncan

li ser destên me maye.

Perîşanê got:

»Eger Ker bê û fîncanê hilde jî, ez nahêlim ew here beriya Şengarê.

Ev

tele ye, ko ji wî ra danîne. Ev rêya hat û nehatê ye. He bila evanên ko li

dîwanxanê da rûnişîne, carekê na deh caran jî fîncana mercan ji destên

we bistînin jî, ez dîsan jî evê mercê napejirînim. Ez ji Kerrî pêve çi kesî

nastînim. Dilê min li ser Kerrî ra çi dilan nahebîne. Ez bimirim ez ya

erdême, ez bimînîm jî ez ya Kerrîm.  
Eyşanê guhdarî li dengê Perîşanê û qawegerînan dikir. Gava ko bihîst,  
kes nawêre qawa mercan vexwe, li dilê xwe da pir şa bû. Tilîlî hatinê. Lê  
li rû va xwe nerehet û aciz nîşan da. Meidekirî û pirçûkdayî xwe li ber  
derê dîwanxanê ra gîhand û serê xwe li derê dîwanxanê ra bire jor  
û got:  
»Emer Axa te kiça me çingand jî, kesekî ji pehlewaniyan te newêrî fîncana feyfûrî li ser telba zêrî hilîne. Evan çima pehlewaniyan î. Navê lawên  
Hesê Dûdêyî tê, evan dest û piyên xwe wenda dikan. Vêca yê bi vê rewşê  
herin û ji te ra lekeyekê li dijminê te bidin û tola te ji dijmini bistînin  
û ji  
te ra Bilîcana Mîrê Ereban bînin. Te evana hemû gazî kiriye. Lê te pehle-  
wanîyan rastî ji bîr kiriye. Te çima neşandiye peyê lawên Werdekê.  
Du  
peyakan bişîne dû herdu pehlewaniyan bila ewan bînin û qaweya mercan  
vexon û herin ji te ra Bilîcana Mîrê Ereban bînin.«  
Gava ko navê Ker û Kuliki hat, dîwaniyan hemûyan li nav çavên hev nihêrî. Hemûyan nav û dengê wan bihîstibûn. Lê hemû jî pê hesiyabûn, ko Ker û Kuliki êl li ser Emer Axayî bir kirine. Çend ridên-sipiyan jî gotinên Eyşanê rast derêxistin û gotin:  
Emer Axa, Eyşan xatûn rast dibêje. Bişîne peyê wan jî bila bînin.

Emer Axayî xwe nerehet kir û got:

»Ew herdu arodeyana kî ne, ko ez bişînim peyê wan?! Ez qet rêya mala

xwe jî nadim mirovên weke wana.«

Ridênsipiyan dîsan lavayî ji Emer Axayî kirin. Emer Axayî ew yeka ji Xudê dixwast, lê li rû va xwe tûre kir û got: He ewan jî eger bên, yê çav li

we bikin û li ser fîncana feyfûrî da neçin.

249

BILÎCAN

Lê ridênsipiyan gotin:

»Tu bişîne peyê wan, bila ew bên û em bizanin kanê ew mêrên çawanin.«

— Êh Kero yê here ji min ra Bilîcanê bîne û tola bavê xwe veke. De hûn

hinde dibêjin, du peyakan bişînin dû wan jî.

Du peyakan nameyek hildan û li zoma Emer Axayî ber bi zoma Werdekê rê ketin. Gava ko gihîştin nava zomê, rast çûne ber derê mala

Werdekê. Li ber derê xîvetê dîna xwe danê ko Ker raza ye û Kuliki jî xwe

daye ber derê konî. Peyakan nama Emer Axayî dane destên Kuliki.

Kuliki name xwend û gote peyakan:

»Herin bêjin Emer Axa, ew çî zaro marûne li dîwanxana xwe da top kiriye. Wan navê mêran jî herimandin. Eva heft şev û heft roje ew qawê

li ber wan digerînin, kes li ser qawê da naçe. Bêjê Kuliki gotiye,  
hemîn

ewî qîza xwe avêtiye heracê û li heracê da jî kes li ser qîza wî da  
neçûye.

Werdek li mal nîne. Kes li ber mala me tune ye. Bila Perîşanê bi  
bûkanî

bixemilîne û ji birayê min ra bişîne, paşê emê bên û qawa wî  
vexon.»

Peyak destevala li ser zoma Emer Axayî da zivirîn û xwe dane ber  
derê

dîwanxanê û gotin:

— Axayê me xweş be! Em çûn Ker li xewa engorî da bû. Kuliki jî got,  
bêje Emer Axayî bila Perîşanê bi bûkanî ji birayê min ra bixemilîne  
û

bişîne, paşê emê bên.

Emer Axayî got:

Ne min baş dizanî, ko ew jî ne mêrên wê hindêne ko bên û qaweya  
mercan vexon. Ca li ber rûyê xwe berhanên zarokane digirin.

Neimetê Îs ko li ber derê dîwanxanê li rex solikan rûniştibû, got:

Kuro we çima name nedaye destên Kerrî, we name biriye daye  
destên

Kuliki. Kulik li ber çî nîne. Namê biherin û bidin destê Kerrî. Tewawî  
dîwaniyan gotinên Neimetê Îsi rast deranîn û gotin:

Namê biherin bidin destê Kerrî.

Peyak li dîwanê derdiketin ko herin zoma Werdekê, Eyşanê gazî  
wan

kir û çend zêr dane wan û gote wan: Evan zêrana hildin. Herin nav  
zoma

wan. Dibêjin niha Zerdêya Şengo bûye berdestka Werdekê. Ew li nav mala wan da serbest e. Herin mala Zerdê û van zêran bidine Zerdê û bi-la ew arîkariya we bike û namê dizîv va bigehîne destê Kerrî. Gava çavên Kerrî bi namê bikeve û navê Perîşanê bibihis, li çi ciyan bend nabe û dê bê. Peyak rê ketin û li zoma Werdekê da xwe bi Zerdê ra gîhandin. Gava

250 BILÎCAN

ko peyakan name û zêr nîşanî Zerdê dan. Zerdê gote wan: »Ya we lêhat ko Kulik îro çûye nêçîrê, zû bikin, hê ko ew ji nêçîrê neziviriye, em xwe bi Kerrî ra bigehînin.« Vêca Zerdê her di gavê da peyak dane dû xwe û xwe bi mala Werdekê ra gîhand û peyak derbasî hundurê çadira Kerrî kirin. Ker hê jî di xewa engorî da bû. Peyakan name danîne ber serê Kerrî . Dibêjin dê û bavên mirovî çawa bin, mirov dikişîne wan. Xûyekî mala Hesê Dûdêyî hebû. Gava ko bitingijiyana, diketin xewa engorî. Wate ga-va ko li himber dijiwariyekê da gîr bikirana, yan bixwestana karekî pir gir-ing û bovedar bikirana, yan li kesekî tûre bibana, berî êvarê, li engora

êvarê da diketin xewê. Ca gava diketin wê xewa engorî, şeş şev û şeş rojan  
li nav nivînan dervediketin. Roja heftan ji xew radibûn. Serê xwe dişoştin. Xwe taze û amade dikirin û dadiketin meydanê û ew diwariya  
li ser rêka xwe bi zora milan, yan jî bi hêza hizirînê ji holê radikirin. Gava  
ko dengê duhol û zurnaya hawarê li ser mala Emer Axayî ket, hawarî her  
di gavê da ji Ker û Kuliki ra hat, ko Emer Axayî qîza xwe avîtiye mazadê.  
Ker li ber kerban dil hebû biteqiya. Çawa Emer Axa dikare ji dilketiya wî  
ra, ji giraviya wî ra, ji berdilka dilê wî ra, wê sivikatiyê bike. Li Sosikê si-  
war bibû, berê xwe dabû zoma Emer Axayî. Lê Kuliki bi çend ridên-sipiyên zoma Werdekê va xwe avîtibûn pêşiyê û li ber geriyabûn û gotibûnê hê raweste, kanê dûmaya karî tê ser çi? Ker bi neçarî zivirîbû  
mala xwe û li ber kerb û tûretiyê ketibû xewa engorî.  
Gava ko peyakan bi arîkariya Zerdê name danîn ber serê Kerrî, ew şeş  
roj û şeş şevên nivistina Kerrî kuta bibû û roj bibû roja heftan. Danê piştînvro bû ko Kerrî bi vebûna devê xîvetê ra çavên xwe vekir û bawîşk  
hatê. Teviziyê xwe rast kir. Li wê demê da çavên wî bi peyakan ket. Bi tûretî pirsî hûn kî ne?

Peyakan nama Emer Axayî ko danîbûn ber serê wî, nîşanî wî dan.  
Kerrî

name vekir û dest bi xwendinê kir.

Hê Kerrî name kuta nekiribû ko Kulik li ber derê çadira Kerrî ji Nijdî peya bû. Kuliki derê xîvetê vekir û dîna xwe dayê ko herdu peyakên Emer

Axayî waye li rex Kerrî rawestane û name dane destên Kerrî û ew waye

namê dixûne. Kuliki çavên xwe li peyakan bada. Lê Kerrî got:

Kulik te çi bi teteran neketibe.

Vêca li teteran pirsî gereyan çî ye? Ca bi hûrgilî ji min ra şirove bikin, kanê çi heye û çi tune ye.

Teterekê destê xwe da peleguha xwe û bi stiran weha bersiva Kerrî da:

251

BILÎCAN

»Hey wî wî...hey wî wî hey wî wî...

Dicivîne, dicivîne, Emer Axa dicivîne...

Şêvreke giran li mala xwe da wê datîne...

Li duhola hawarê dixîne...

Giştî giregirên heşt hozan li mala xwe da dicivîne...

Fîncana feyfûrî ew hiltîne...

Bi sê dangan li Êxoyê file diheytîne...

Êxo bîneya Perîşanê li ser fîncanê dikişîne

Fîncana feyfûrî li ser telba zêrî datîne...

Telba zêrî li ser masê diedilîne...

Mîrza kaxetekê dinivîse li rex datîne...

Qawegerîn fîncanê li nava dîwanê digerîne...  
Dibêje her kesê fîncana feyfûrî li ser telba zêrî hilîne...  
Yê here beriya Şengarê Qîracê Daran, Gola Eynolhayê, deşta berî û  
berîstanê li nava hefthezar û heftsed malên Eliyê Siwarani, bi zora  
darê  
dar rimê Bilîcanê ji min ra bîne...  
Bi helaliya Xudê Perîşanê ji xwe ra bistîne...  
Hey wî wî ...hey wî wî hey wî wî...«  
Peyaki bêhna xwe veda û difina xwe hilkişand û devê xwe mirçand  
û  
dîsan dest pê kir:  
Hey wî wî...hey wî wî hey wî wî...  
Eva heft şev û heft roj in def û dohola dikutînin...  
Peyakan dişînin, li nava berangelan, rojê sî çil beranan dînin...  
Her sî çilan li rojê da ser jê dîkin, li sîtil û mencelan da dikelînin...  
Li nîveka dîwanê li nava curnan da wê datînin...  
Birincê qereçamê û dûvê beranan li ser dihirşînin...  
Îsot û zehferanê lê direşînin...  
Pehlewan û xoşmêran lê dicivînin...  
Li dû ra şîrînî û şerbetan digerînin...  
Hey wî wî hey wî wî...  
Denge, heraye, hawariye, giştî bokeberanan li nava dîwanê da  
rûniştînin...  
Ev heft şev û heft roj in qawegerîn qaweya mercan li ber wan di-  
gerînin...  
Li tirsawên Hesê Dûdêyî da, bokeberan wê fîncanê nahilînin...  
252 BILÎCAN



Xoşmêr û pehlewanên heşt hozan li ber şerman serên xwe li ber  
xwe  
naderînin...  
Kep daxistin ser simbêlan, kûr diponijin, diporînin...  
Dest davêjin qeder û qelûnan dikişînin...  
Xwe li kêşana qeder û qelûnan da dixapînin...  
Li ber dûkelê li hundurê dîwanxanê da hevdu nabînin...  
Dema bîneya Perîşanê li ser fîncana feyfûrî ew dibînin...  
Kûr keseran dikişînin...  
Li xûya şermê da ew dimînin...  
Xûyê li ser tefeşên xwe vedimalînin...  
Xwe li ser kulavan da difirikînin...  
Li ser konî da xwe davêjin, hebinê konî li ser sûngan da dişiqitînin...  
Çarde peyak li ber konî sekinînin...  
Mêkut û sûng û hebin li destên wan da ye, pêşbend û paşbendên  
konî  
dişidînin...  
Hey wî wî hey wî...  
Emer Axa em şandine dibêje Kero zû bike zû bilezîne...  
Xwe bi dîwana min ra bigehîne...  
Fîncana feyfûrî li ser telba zêrî hilîne...  
Nav û dengê xwe li cîhanê bixîne...  
Here beriya Şengarê Bilîcana Mîrê Ereban ji min ra bîne..  
Na Xudê tola bavê xwe hilîne...  
Perîşana qîza min bi helaliya Xudê ji min bistîne...  
Hey wî wî heywî hey wî...  
Vêca Kerrî li bersiva peyakan da destê xwe da peleguha xwe û weha  
qîr

kirê:

Hey wî wî hey wî wî...

Ez Kerrîm, Kerê Silêmîn im..

Lawê werdeka dîn im...

Nebiyê Silîv beg û Hesê Dûdê şêrê pişthêşîn im...

Axa û beg îm, ji çî began qet namînim...

Ez hevalê pehlewanên wî yên tirsenok nîn im...

Herin bêjinê bila Perîşanê bişîne ber mala min, paşê ezê bêm û  
fîncana

qawê li ser masê wî hilînim...

Li dû vê stiranê ra, Kerrî devkî gote peyakan:

253

BILÎCAN

»Herin bêjin Emer Axayî, eva heft şev û heft roj in ko te giştî  
pehlewan

û bokeberanên xwe yên navdar li dîwana xwe da top kiriye, dengê  
duhol

û zurnaya we der û deşt hejand. Ew pehlewan nînin, birek golik in  
ewî

top kiriye û mêvandariyê li ser wan datîne. Kesî newêrî fîncanê  
hilîne,

lewra tu li me poşman bûyî û taze tu dişînî peyê me. Herin bêjinê  
ev heşt,

neh roj in ko meta Rewşê, Werdek gazî kiriye. Mala me bê bermalî  
maye.

Bila Perîşana qîza xwe bi bûkanî ji min ra bixemilîne û bişîne ber  
mala

min, ezê paşê bême dîwanxana wî û qaweya wî vexom.«  
Ker li ber hêrsan sorpiliqî bibû. Ew şeş şev û heft roj bûn, ko ketibû  
xe-  
wa engorî. Çav li serî da perçivîbûn. Navê Perîşanê hiş û hedam û  
aqil û  
sewda ji serê wî deranîbû. Li nav nivînan derket û karê şoştin û  
veşoştina  
xwe kir.  
Peyakan jî patika xwe xurandin û ber bi zoma Emer Axayî zivirîn.  
Li dû çûyîna peyakan ra, Kuliki gote Kerrî:  
»Ker tu çî dihizirî. Ev telbend e Emer Axayî wê ji me ra daniye. He  
em  
neçin beriya Şengarê jî, ezê bi zora darê dar rimê, Perîşanê ji te ra ji  
Emer  
Axayî bistînim. Ew li destê me da bînanî fireka avê ye. Emê peyamê  
ji  
Perîşanê ra bişînin û bila ew bi berhaneya seyran û bindarûkê li mal  
derkeve û emê herin bigrin çingilê wê û ewê hildin û bînin. Piştî  
hînga  
ridênsipî û giregirên êlê dê bikevin nîveka me û me pêk bînin.«  
— Na Kulik, wisan nîne. Em sibê herin li bindarûkê da Perîşanê  
bînin,  
xelkê bêje Emer Axayî ew hemkûfî xwe nizanî û qîza xwe neda wan,  
lew  
ra ew çûn Perîşan revandin. Ez dixwazim bi mêranî, bi zora şûr û  
hêza  
nêza xwe Perîşanê ji Emer Axayî bistînim û nav û dengê xwe belayî  
cîhanê bikim. Ez serê xwe li ber Emer Axa û yê natewînim.

Revandina qîzan û diziya kulînan wekî hev in. Ez ne diz im. Ez mêrxasim û dixwazim bi mêrxasî Perîşanê ji xwe ra bixwazim. Ezê wisan bikim

ko Emer Axa bixwe qîza xwe ji min ra siwar bike û bişîne ber derê mala

min. Waye ev heftiyê, mêvandarî daniye. Dengê duhol û zurnaya wî,

dengê mêvandariya wî û fîncana wî ya feyfûrî balavî nav cîhanê bûye.

Nîvê Kurdistanê bi wê zirhazirê hesiyan e. Hemû pê agadar bûne, ko

Emer Axayî qîza xwe bona mahînekê avîtiye mazadê. Taze ketiye stuyê

wî da. Kes jî newêre fîncanê hilîne. He li ber wê hindê neçar maye, lewra

şandiye peyê me. Em jî naçin ta kû ew Perîşanê neşîne ber mala me.

Eger

îro ew mêvandariya wî hema wisan bê akam bimîne û pehlewaniya wî bêy

wê hindê ko jê ra karekî bikin, jev belaw bibe, êdî ew nikare serê xwe li

nav dost û dijminan da derîne. Taze dijminê li hêza wî agadar bin û li

254 BILÎCAN

patika wî siwar bin. Ew bimre jî naxwaze ew mêvandariya wî bêçine belaw bibe. Giştî dijminan guçkên xwe lê beliqandine. Eger em neçin,

kiçik qet, yê bixwe jî şev da were xwe bavêje ser dest û piyên me.«  
— Kerê bira, mirov dibêje te, tu zîz dibî. Xoşevîstê min, ma xudanê Bilîcanê raza ye, tu herî hema wisan sanahî Bilîcanê hildî û bînî!?

Emer

Axayî gotiye, gereke Bilîcan bi şer û lêdan, ne bi dizî bête ber derê min.

Ca ez dibêjim eva telike ewî ji me ra daniye.«

Kerrî xwe li Kuliki tûre kir û gotê:

— Te xê re? Tu li niha da her bieciyî!? Netirse eger tu nexwazî, ez te bi

xwe ra nabim. Tu nayê neyê. Ezê her tenê herim beriya Şengarê.

Hindî Kuliki kurt got, Kerrî dirêj kir. Ker bi tûretî ji cî rabû, û gazî meyteran kir û got:

»Kuro hespan zîn bikin! He hindik maye ko Emer Axa bi xwe bê, yan jî Perîşanê bişîne.«

255

BILÎCAN

33

Peyakên Emer Axayî stuxwar û destevala li ber derê dîwanxanê rawest-

abûn û rûyê wan nedigirt, herin hundur.

Dengek ji hundurê dîwanxanê hat:

— Kuro ka hûn hatin? Lê kanî Kerr û Kulik? Ne min zanî ko ew jî mêrên wê hindê nînin. Ca werin bêjin kanê çi ji xwe ra kirin berhane?

Herdû peyak jî lalomalo bûn. Zimanên wan lev aliyan. Yekî ji wan bi zorê karî bêje:

»Ezbenî Kerrî digot... digot, ta Emer Axa Perîşanê bi bûkînî nex-emilîne, û neşîne ber mala min, ez nayême dîwana wî.«

Peyakê dî jî zimanê wî vebû û got:

»Ezbenî Kerrî dida xeberan û digot, ew çi golikmolikin ewî li dîwana xwe da berev kiriye? Îro roja mêraye, ne qorixa golikaye.«

Emer Axa lê helat û gotê:

»Bes e! Bes e! Seyê mirar!«

Bi axiftina peyakan ra, giştî dîwanîyan serê xwe xistin ber xwe. Te dig-

ot qay xwelî li ser dîwanî û dîwanxanê da reşandine. Bû kuştekuştâ qelûn

û qederên wan û rûmetên xwe li nav dûkela qelûn û qederan da veşartin.

Kesî serê xwe li ber xwe dernexist û li hevalê xwe mêze nekir.

Nîveka

dîwanxanê li ber dûkelê nedihate xûyanê. Çavên Emer Axayî reş û tarî

bûn. Bi zorê karî li dîwanxanê derkeve derva û ber bi aliyê malê here.

Gava ko Emer Axa li dîwanxanê derdiket, Eyşan bi koma keniz û kulfe-

tan va hatin pêşiyê û ketin bin milên wî û ew birin xîveta taybetî.

Emer Axa xwe li nîveka xîveta taybetî da avîte erdê û naliya û got:

»Te dît heçê avirûya me jî mabû, ji dest me çû. Em pak bê avirû bûn.

Lê emê niha çawa bikin. Kero gotiye, ta Perîşanê bi bûkanî nexemilîne û

ji min ra neşîne ez nayê dîwanxana wî...

— Qet dilê xwe neke. Ezê wê rêkê jî li wî bibirim. Vaye nexşa me lê di-

gire. Emê rabin Perîşanê bixemilînin û li ser kurên Werdekê da bişînin.

Dema ko çavên wî li Perîşanê bikeve, hiş û hedamên wî yê li serî da nemînin. Yê bê dîwanxanê û qehweya mercan vexo û emê wî ya ber bi

256 BILÎCAN

beriya Şengarê bişînin. Yê here û êdî neyê. Emê jî herin û destên kiça xwe

ra bigirin û hildin û bînin. Tu rabe here bal mêvanan, ezê Perîşanê ser-

wext bikim.

Vêca bi gotina xwe ra li xîveta Emer Axayî derket û ber bi xîveta Perîşanê çû. Perîşan li xewa pašînîvro da bû. Lê xwe xew ra avîtibû.

Ew

demanê dirêj bû ko xew li çavên wê neketibû. Reng li rûçikê wê da

nemabû. Hindî ko destê zorê destê wê û Kerrî jev qetandibûn, erd û es-

manan ew nediheband. Pêşîra çî evîndarî ra dernekeve. Agirê evînê dema

ko gur bû, çî av neşê wî agirî bitemirîne. Agirê evînê ji agirê her arakê gur-

tire. Eve demaneke ko Perîşan li agirê dûriya Kerrî da dişewute û li ber

evîna wî bûye bengîn û her xwe dide goşeyekî konî û li ber xwe da  
sti-  
ranekê dibêje û dilorîne. Pêş da şerm dikir, ewê stirana xwe bêje, lê  
bere-  
bere rûyê wê vebû, hema li bal her kesî destê xwe dida peleguha  
xwe û  
hêdî û hûrik qîr dikirê û digot:  
Hey wî wî, hey wî wî...  
Gelî gundîn û cînarno, ezê nifirekê bikim, hûnê bêjin amîne...  
Heçê kesê nîveka du dil û çar çavan lev dixîne...  
Bi destê zorê destên du dildar û evîndaran lev diqetîne...  
Bila xêrê bike, wayê qet nebîne...  
Bila ava reş bête çavan, tiliyênê felekê çavên wî derîne...  
Êşa zirav bigrê, sîh û mîlakên wî bihelîne...  
Bila penceşêra mirinê dil û hinavên wî biqetîne...  
Ava zer jê bizê, kotîbûn keran jê bixîne...  
Bila stûna mala wî bişkê, li bin ax û awerê da ew bimîne...  
Hey wî wî, hey wî wî...  
Gelî komelê ezê nifirekê bikim, hûnê bêjin amîne...  
Bila bavê minê xêrê bike wayê qet nebîne...  
Çawa destê min evdala Xudê ra negirt, wezê nedame Kerê dîn e...  
Îsal heft sal e dilê min tê da min dihbîne...  
Ez dibêjim ew dijmin e, qet bav nîne...  
Delalê dilkê min evdalê, li nav komê radiqetîne...  
Îro li ber kerb û kînan nexşe û pîlanan dijî lawkê min dikşîne...  
Giregira ji xwe ra li nava heşt hozên bavan da dicivîne...  
Min porkurê, min dêranê li nava hozên heşt bavan da diçingîne...  
Min porkurê li ber çavên delalê dilkê min dixîne...



Hey wî wî, hey wî wî...

257

BILÎCAN

Dayîka wê çû li ber serê wê rûnişt. Perîşan xurmaş bibû. Lêvên wê diliviyân. Te digot qay li ber bestan jî ewê stirana xwe dibêje. Eysê xwe da

ber serê wê. Destên wê kire nav destên xwe. Perîşanê çavên xwe vekirin.

Eysanê jê ra bendek weha li hev anî û bi dengekî zîz jê ra weha got: Herê lê lê Perîşanê...

Bi navê bi nîşanê...

Heyva di çardanê...

Dayîka te qurbanê...

Berdilka dilê me hemiyanê...

Ca rabe ji xewê ye...

Girê bide bejnê û balê ye...

Vexo çayê û qawê ye...

Xwe bixemilîne bi heft qelemê ye...

seyrika sibê ra here mala kurên di Werdê ye...

Emê herduyan bixapînin, têkin di telê ye...

Bi gef bişînin ser êla di xalê ye...

Şandin li dest meye, hatin li dest Xudê ye...

Emê tola xwe lê vekin, li ser rûkê vê dinê ye...

Bila konên wan mîrate bimînin hêviya di xelkê ye...

Perîşanê li nav çavên dayîka xwe nihêrî. Serê xwe li ser palgî û serînan

rakir. Bi gotinên dayîkê ra agir li serê wê ket. Agiro kê tu gur kirî. Êdî şer-

mê dav û derling hildabûn. Ev dayîka wê bû ko ji evîndarê wê ra, ji berdilka dilê wê ra, ji kilê çavên wê ra, ji qudûmê çokên wê ra weha nexşên dexesiyê dikişîne û dil heye bi destê wê xoşdeviyê wê bişîne mala

mirinê. Destê xwe da peleguha xwe û weha bersiva dayîka xwe da: Dayîkê dêranê ez ranabim ji xewê ye...

Girê nadim bejnê û balê ye...

Venaxom çayê û qawê ye...

Xwe naxemilînim bi çi qelemê ye...

seyrika sibê ra naçim mala kurên di Werdê ye...

Naxwazim xwe bikim destiyê di kêrê ye...

Naxwazim kê m be tûkek ji serê kurên di Werdê ye...

Dayê dêranê Kero berdilka dilê vê keçê ye...

Ez Kerê delal ça car nadim bi bav û bi birê ye...

258 BILÎCAN

Dayîka wê çavên wê ramûsî û li ber dilê wê ra çû. Li ber geriya û gotê:

»Lawo rabe avirûya bavê te li gireva çûyîna te da ye. Tu neçî, êdî buhayê

bavê te li nava komelê da ji pûşikek kaya rizî jî kêmtir dibe. Rabe bo xatirê

nav û dengê bavê xwe, here zoma werdekê, belkî bavê te dikare li nav

xelkê da serê xwe bilind bike û bêje mêrxasekî bînanî Kero li nav êla min

da heye.«

Perîşan jî li derdê dûriya Kerrî da şewitî ye. Dilê wê bona dîtina Ker  
bî-

nanî cûncika li devê pişîkê da pirtepirta wê ye. Dilê wê dixwaze here  
û

Kerrî bibîne. Li dilê xwe da got: Bilanê, ezê rabim û herim û evê  
pîlana bi

dexesî ji wan ra eşkere bikim û nehêlim wan bên mala bavê min û  
ez jî êdî

qet nazivirim vê çolbûyê.

Li ber gotinên dayîka xwe serê xwe kire ber xwe û bêdeng ma.

Dayîkê zanî ko dilê Perîşanê jî dixwaze here, Kerrî bibîne. Gazî keniz  
û

kulfet û berdestk û xemlîneran kir û Perîşan da destê wan û got:

»Hûnê îşev di êvar da li ber Perîşanê rûnên û jê ra bêjin û bikenin.

Bila

dema wê saz bibe. Hûnê ewê bi heft qeleman bineqîşînin û bi heft  
ren-

gan bixemilînin. Bila sibê dilê kurê Werdekê bilerizîne û ewî li ser  
dîwanxanê da bişîne.«

Eyşanê ev got û li bal wan derket û çû xîveta xwe ya taybetî. Keniz  
û

berdestik û xemlîneran ta nêzîkiya sibêdê ji Perîşanê ra gotin û  
keniyan û

yarî û henek kirin; tev xwarin û vexwarin. Berî seûgura sibê ew bi  
heft

qeleman neqîşandin û bi heft rengan xemilandin. Hê berê sibêdê  
gewr

nebibû ko Eyşan hate ber derê xîveta Perîşanê û ew bi komek qîz û bûk

va, bi cêrî û kenizên wê va, rê kire ser konê kurê Werdê.

A, ev mak e, ew sake.

Mak dilreş e, sak dilpak e

Makê sakê bixapîne li rê ke

Yê xemla wê lê ke.

Bejna wê çê ke.

Wê li ser kurên Werdekê da bi kîn rê ke.

Agiri li mala kurên di Werdekê ke.

Her çend ko Perîşanê ji Xudê dixwast çavên wê dîsan li nav çavên Kerrî

bikeve, lê dilê wê li wê çûyîne xweş nebû. Dil agah li her tiştî ye. Dilê wê

dilerizî. Bi neçarî, bi dilê kul û çavên şil bera xwe da zoma Werdekê.

Hê

taze zeratiya sibêdê dabû serê çîyan ko Perîşanê xwe bi konê kurên

259

BILÎCAN

Werdekê ra gîhand. Kerr hêştta li xewa sibêdê ranebûye. Lê Kulik waye li

ser seyîsan ra rawesta ye, û hespan bi wan dide tûmar kirinê. Kuliki dîna

xwe dayê Perîşan waye bi gulteyek qîz û bûk va li ber derê mala wan rawesta ye. Kuliki di dilê xwe da got: Xudê kem ewan waye Perîşan şandin, Werdek li mal nîne, ewan yê Kerrî bixapînin, û bişînin beriya

Şengarê. Ez herim çend giliyan ji Perîşanê ra bêjim û ewê bizivirînim.

Bila Ker qet pê nehese û ev aşîta bêy derdeser li der mala me rêç bibe.

Ewî seyîs sergermî tîmara hespan kir û bixwe tenê hate pêşîya Perîşanê

û bi stiran ji Perîşanê ra got:

Hey wîwî, hey wî wî....

Perîşanê xayîngê dilê min kîne kîn e...

Bide xatirê Xudê û peyxemberan û qurana mubîne...

Minê îşev êvar da xewnên xerab dîne...

Minê didît du didan li devê min firîne...

Hatina te ya şerê ye, ya xêrê nîne...

Tikaye, bizivire, here, Kero palda ye, Werdê li mal nîne...

Here bila çi kes li te nehese te nebîne...

Bide xatirê Xudê bila konê me mîrate bi hîviya xelkê va nemîne...

Hey wî wî...

Perîşanê serê xwe kire ber xwe û weha bersiva Kuliki da:

Hey wîwî...

Kuliko dîno deşta heranê darên bîne...

Dilê min evdala Xudê kîne kîn e...

Serê dilê min kul e, binê dilê min birîn e...

Kezeba minê pirtî pirtî bûye, hinavê min peritîn e...

Ev yeka bi destê min evdala Xudê nîne...

Ev pîlanê bavê minê ji birayê te ra wê dikişîne...

Na Xudê tele ye ji we ra wê datîne...

Wisana dike hûnê herin bêne kuştin, konê we yê bêxwedî hîviya xelkê

va bimîne...

Birayo rastî çî ye, ji bo Xudê ew dimîne...

Meriv zeriyan li der mala xwe kor û poşman desteval nazivirîne..

Ez hatime, du gotinên min heye, ezê ji Kerrî ra bêjim, bila dilê we ji min nemîne...

Neçin venexon qawa mercan, bila ew li ser masê her bimîne...

260 BILÎCAN

Kuluki dîna xwe dayê Perîşan waye hatiye Kerrî şîret bike û nehêle ew

here beriya Şengarê. Li dilê xwe da got: de bila here belkû ewê Ker ser-

wext kir. Eger ewê Ker serwext kir û nehîşt Ker here, her bila li mala me

da bimîne û Emer Axa êdî nikare ewê ji nav lepên me derîne. Emê ridên-

sipî û giregiran bişînin mala wî û li kutayê da her pêkhatin û aşitiyê çê

bibe. Bi van hizran Kuliki xîveta Kerrî nîşanî Perîşanê da û gotê:

A, ewa hanê xîveta Kerrî ye. Here ji xew rake û li ber da bixûne, belkû

te ew serwext kir.

Perîşan bi koma qîz û bûkan va ber bi xîveta Kerrî çû û Kulik jî dîsa çû

bal meyteran.

Perîşanê devê çadirê vekir û bi gulta qîz û bûkan va dakete hundurê çadirê. Dîna xwe dayê ko Ker waye li xewa şîrîn daye û mişîna xewa wî

ye. Pêş da dil neda ewî ji xew rake. Lê paşê çû li ber serê wî rûnişt û  
destê  
wî kire nav destên xwe û hêdîka miz da. Seheke xweş û dilkêş giştî  
leşê wê  
ricifand. Germayê dilê wê kelijand. Keniz û kulfet û heval û hogirên  
wê  
jî hemû li ser serê wan ra rawestane û li wan dinihêrin. Ker li nava  
nivî-  
nan da qilqilî û kêleka xwe guhest. Hêdîka çavên wî ji hev vebûn.  
Pêş da  
we hizir kir ko xewnan dibîne. Lê paşê dengê Perîşanê ew li ser  
hemdê  
xwe da anî. Perîşanê hêdî û hûrik bi dengê xwe yî zîzî zelal weha ji  
Kerrî  
ra digot:  
Hey wî wî....  
Kero rabe ji xewê ye...  
Delalo rabe ji xewê ye...  
Girê bide şeir û rîşî kolozê kal û di bavê ye...  
Pev xe şûr û nêze û xencerê ye...  
Agaha te hebe li karê vê dinê ye...  
Bavê min lêdaye defa hawarê ye...  
Sed û bîst û pênc bokeberan berev kiriye aliyê dîwanê ye...  
Fîncana feyfûrî daniye ser payê ye...  
Paye daniye ser telbêye, telbe daniye ser masê ye...  
Li ser fîncanê kişandiye bîneya min zeriye ye...  
Kaxetek nivîsiye daniye rex fîncanê ye...  
Dibêje kê hilde fîncanê li ser masê ye...

Ewê here bîne Bilîcana Mîrê Ereban bi zora darê dar rimê ye...  
Ezê bidemê da, Perîşana qîza xwe bi helaliya Xudê ye...  
Xudê kem ew te dixapîne te bi şer dişîne li ser êla di xalêye...

261

## BILÎCAN

Konê weyê mîrate bimîne hîviya di xelkê ye...  
Sibê min nekin destiyê di kêrê ye...  
Bi dengê Perîşanê ra, serê Kerrî gêj bû. Topa cîhanê li dora serê wî  
ra  
zivirî. Destê xwe li gerdena perîşanê ra bir û ramûsanek jê istand û  
weha  
bersiva wê da:  
Perîşanê dilê min kîne kîn e...  
Delalê dilê min kîne kîn e...  
Xoşewîstê dilê min kîne kîn e...  
Mêr ewe li ser gift û bextê xwe bimîne...  
Min du gotin ji bavê ta ra wê şandîne...  
Ew jî mêrmêrane gotinên min dipejirîne, te ji min ra wa dişîn e...  
Wekî ez neçim buhayê mêraniyê ji min ra nîn e...  
De tu bibe bermaliya mala giran, li ber malê wê bimîne...  
Ezê herim kanê çi heye û çi çunîne...  
Ker rabû kincên xwe yê pehlewaniyê li xwe kir. Şûr û xencer tev  
girêda.  
Nêza xwe da destê xwe. Zirêxê xwe avîte pêsîra xwe. Topizê xwe li  
bin  
kewşê xwe danî. Kulavqotê xwe da serê xwe. Mertalê xwe ra kir û  
gazî



Kuliki kir:

»Kulik ! bêje meyteran bila hespan amade bikin!«

Kuliki destê xwe li çoka xwe xist û di dilê xwe da got:

Xudê kiçkê eva xapand û ewê here û me şepirze bike û destên me  
û

xalên me têxe hev. Kuliki bi dengekî şewat ko rehê tûretiyê tê da  
diyar

dikir, li Kerrî qûriya û weha gotê:

Kero mala te şewitiyo, dilê min kîne kîn e...

Bide xatirê yezdan û şêx Şemdîne...

Were destan ji vê yekê tu hilîne...

Ev davike Emer Axa ji te ra wê dikişîne...

Dixwaze bi vê yekê te li ser rêka xwe hilîne...

Na Xudê dil bi kul e dixwaze tol û heyfan ji te bistîne...

Te bi şer li ser xalan da wê dişîne...

Şerê xal û xwarziyan bînanî rîşa kotîbûnê derman jê ra qet tunîne...

Tu dizanî dayîka Werdek li mal nîne...

Were emê bişînin peyê Werdekê bila Werdek were me bibîne...

262 BILÎCAN

Şîrê sipî da ye me, bila li gerdena me aza bike, belkû Xudê karê me  
lev

tîne...

Nifirên Werdekê li dû me nexe, nifirên day û baban li dû meriyan  
bikeve, xêra meriyan qet tunîne...

Li dû ra Kuliki devkî ji Kerrî ra got:

Kero bira, dayîka me li mal nîne. Bihêle em bişînin peyê dayîka xwe  
û

bila bê, kanê ew çî dibêje, paşê. Mala te kavi nebe, dayîka meye,  
şîrê sipî

daye me. Em li tehlî û tengiyan da xudan kirine. He bihêle bila were,  
em

xatirê xwe jê bixwazin, paşê. Ma tu yê herî nêçîra pezkûviyan, te  
serê xwe

xistiye ber xwe û tu diçî. Tu dixwazî herî beriya Şengarê. Eva şer û  
lêdan

û kuştin û girtin têda ye.

Ker tûre bû û got:

»Kulik! Min daxwaz û peyama xwe ji wî ra şand. Ewî jî waye mêmê-  
mêranî daxwaza min pejirandiye û Perîşan ji min ra şandiye. Wakî  
ez

neçim, buhayê mêraniyê ji min ra namîne. Buhayê min dibe buhayê  
pûşekî çolê. Niha xweşmêr û bokeberanên heşt bavan li dîwana  
Emer

Axayî da rûniştine û çav li riya menin. Eger em neçin yê bêjin, ta  
niha

nediwêrîn bihatana, îca berhane digirtin. Niha ko Emer Axayî mêmê-  
mêrane kiça xwe jî şandiye hîviyê, vêca bînanî rûviyan xwe  
vedişêrin.

Dîna xwe bidinê çend mêmêrên bê bext û bê gift û peyman in. Navê  
mêran

li wan heram be.«

Vêca berê xwe li ser meyteran da kir û got:

»Kuro Sosikê ji min ra zîn bikin. Ezê hema tenê herim. Bila Kulikê bi-  
ra li ber malê be. Ew ji kevçiya xûna xwe ditirse.«

Kulik li ber geriya û gotê:

»Bira wisan nîne. Her tişteke rêka xwe heye. Bihêle em bişînin bila Werdek bê, paşê tu çawa bêjî ezê wisan bikim.«

Li wê naweyê da meyteran Sosik bi zîn û pûsad va li ber Kerrî amade kirin û zengiya wî dagirtin. Ker siwar bû û li rê ket. Kuliki jî bi lez xwe tev

girêda û li nijdî siwar bû û kete dû wî. Her dû pêkve gehîştin ber derê

mala Emer Axayî. Meyteran serê hespên wan girtin. Ker û Kuliki dadane

hundur. Silav li komelê kirin. Çi kesî silava wan venegirt. Kulik tevgirê-

dayî sîngî li destî da, li ber derê dîwanxanê rawesta. Kerrî komel pêpes

kir û dada ser fîncanê. Fîncana feyfûrî li ser telba zêrî hilanî û li ser sim-

bêlê palikî da kir û fîncan kire berîka xwe û li dîwanxanê derket. Li hun-

dur dîwanxanê da ew bokeberan û xweşmêrên ko eva heft şev û heft roj

263

BILÎCAN

bûn, fîncana qawê li ber wan mabû, kesî nediwêrî ser da biçûya, devojenî

hevdu bûn û ser û guhên hevdu girtin û li hevdu ba ketin.

Ewî digot min li ber te hilneda. Yê dî digot min li ber filankesê hilneda. Her yekê sîcê hilnedana fîncanê dikirin stuyê ewê dî da û li hundurê

dîwanxanê da bû şingîna şûr û sûngiyan. Bokeberan li hev baketin.  
Xûnê

dîwanxane hilda. Emer Axa li nav wan derket û got:

»Kuro bila li hev bidin. Çi kes nekeve navcîtiyê. Eva hefteyeke hemû kor bibûn. Taze ko pehlewane min ew hemû pêpes kirin, li xwe hesiyane.«

Vêca xwe bi Ker û Kuliki ra gîhand û gote wan:

»Her bijîn! We serê min li nav xelkê da bilind kir. Herin karê xwe bikin

û sibê zû li rê bikevin. Ka we çî pêdivê jî, em ji we ra amade bikin.  
Eger

hûn hez dikin, ezê jî çend siwaran bi we ra danê.«

Ker û Kuliki pejirandin û li hespên xwe siwar bûn û zivirîn zoma xwe. Emer Axa jî çû aliyê xîveta xwe ya taybetî.

Bokeberan û mêrxasan jî hind li hevdu dabûn, ko pirtik li ser hevdu xistibûn. Yê ko li hespên xwe siwar dibûn û direvîn. Yê ko termên kuştîyên xwe hildidan. Yê ko birînên xwe girêdidan. Dengê duhol û

zurnayê jî ji mêjve vetexirîbû. Dîwanxane li qasekê da vik û vala ma. Emer Axayî gazî Eyşanê kir û gotê :

»Eyşan were xîvetê! Gazî Neimeti jî bike, bila bê!«

Emer Axa û Eyşan û Neimet dîsan bînaî caran li xîveta taybetî da berev

bûn û şêvir giran kirin. Emer Axayî got:

»Ez ditirsim Ker û Kulik herin û dîsan bi tendurustî bizivirin. Eger ew vê carê bizivirin, êdî ez qet nkarim li ber wan deng bikim û ew her li zivi-

randinê da de axatîyê jî ji min bistînin. Kero gotiyê axatî ya kalkê min  
bûye, Emer Axayî lê istandiye. Em debê karekî wisan bikin, ko êdî ew ji  
vê rêbwariyê tendurust nezivirin. Weren em tevbîrekê bikin û mirazê  
wan li çavên wan da bihêlin. Bi dîtina min em gereke destekî li nav cerda  
kurên Werdekê da çê bikin. Destekî wisan ko li para va xencerê li wan  
bide.«

— Erê Emer Axa tu rast dibêjî. Bi dîtina te em kê digel wan bişînin, başe?

— Neimet çî ye! Lê Neimet xwarziyê me û çî rojê ye?!

— Ez li xizmeta we da hme. Lê çî ji destên min tê?

— Çawa çî ji destên te nayê! Gelek kar ji destên te tê. Ma wisan nîne

Eyşan?

264 BILÎCAN

— Erê Xudê kem, her karekî ko tu bêjî ji destên Neimetê xwarzî tê. Vêca Emer Axayî berê xwe li ser Neimeti da kir û gotê :

— Ezê sibê Êxoyê file jî bi heceta tûjkirina şûr û rimên wan, bi wan ra

danêm. Tu û Êxo pişta xwe bidin hev û pêkve devê şûrên wan vergerînin.

Sûngiyên wan xirek bikin. Êdî ma hûn ko zaro nînin ez we şîret bikim.

Her hela ko ji we ra helket, wêcê jê vegirin.

— Bilanê, her çiya ko ji destên me bê, em xwe lê nahêvişînin.

— Ez dizanim tu xwarziyekî emek helal î.

Eyşanê çavên xwe li Emer Axayî ra qirpand û berê xwe li ser Neimeti da

kir û gotê:

— Hemîn mara kurmet û kiçxalan jî her li ber perên asimani hatiye birînê.

Neimet girijî û serê xwe kire ber xwe da.

Emer Axayî jî got:

— He ya rast û durust jî ew e. Eger Ker û Kulik tendurust venegerin, Perîşan bimire ya erdêye. Bimîne jî ya Neimetê delal e. Ca Emer Axa bi

vê gotina xwe ra, li xîveta taybetî derket û li derva dest bi pêgermoka kir.

Şevê jî hêdî hêdî perçema xwe ya reş dikişande ser tefeşa rojê û hewa hêdî

hêdî tarî dikir.

265

BILÎCAN

34

Şevê cîhan dagîr kiriye. Her tiştên ko li ser rûyê vê cîhanê da heye, li

reşatiya şevê da noqim bûne. Emer Axa dîsan fenanî caran li dîwanxanê

da rûniştiye. Li nava palgî û berpala da cûm bûye û lemisî ye. Kolozê wî

daketiye ser birû û bijangan. Desdtên xwe li pişt serê xwe ra lev şe kiriye.

Lingên xwe dirêj kiriye û li ser hev ra avîtî ye. Dîwanxane taze bilaw bûye.

Kes li dîwanxanê da nema ye. Bêhna dûkela qelûnan, germaya leşê mirovan û xûnê hê jî li dîwanxanê da lev digere. Hê bêhna hulma keserên

bokeberanan bona Perîşanê li dîwanxanê da maye.

Emer Axayî destên xwe li pişt serê xwe hilanî. Lingên xwe kişande ber

xwe. Kolozê xwe serast kir û toza cilkê xwe dakuta û çarmêrkî rûnişt û

gazî kir:

— Kê li wê derê ye.

Du sê dangan bi hev ra bersiv dan: Fermo ezbenî!

— Hevrê ca were vira! Bêje qawegerînên dî jî bila herin û razên!

Ewan

ev çend şeverojin nerazane.

— Fermo ezbenî!

— Qawegerînên dî hemû çûn?

— A, ezbenî waye diçin.

— Were!

Hevrê li ber deri rawesta û got:

— Fermo ezbenî!

Ewî dizanî dîsan fermanberiyeka wî ya giring heye. Lê nedizanî çî ye.

Emer Axayî li nav çavên wî nihêrî û pê ra girijî û gotê:

Here gazî Mîrza Qadiri bike, bila bêy gîrobûn bê dîwanxanê. Bêjê bila

kaxet û qelemên xwe jî bîne.

— Baş e ezbenî.

Hevrê bi lez ji konî derket. Bû repetepa piyên wî. Li dû ra rewterewta

çend seqan li ber guhan ket. Lê dengê seqan zû vetexirî.

Mîrza Qadir tena kiras û derpiyên caw derkete ber hêşiya konê xwe û

pirsî :

266 BILÎCAN

— Ew kî ye?

— Ez im mîrza!

Mîrza li tariyê da dengê peyakê sivik nasî. Li dilê xwe da got: Evana nahêlin mirov şev jî li mala xwe da biêwire. Pirsî:

— Xêr e Hevrê ?

Hevrê nêzîkî bi wî kir û hêdîka gotê:

— Emer Axayî digot bila zû bê. Digot bila kaxet û qelemên xwe jî bîne.

Mîrza Qadirî li ber lêva xwe da, wisan ko mirovî her bazorê jê seh fikir,

got:

Îca vê nîveşevê çî qewumiye? Name bû, minê sibê binivîsiya.

— Emer Axayî digot bila lezê bike, min karekî giring pê heye.

Mîrza Qadir çû hunduri û şapik û kurtikê xwe li xwe kir û kaxet û qelemên xwe hilgirt û ew û Hevrê tev ber bi dîwanxanê leziyan. Tev gi-

heştin ber derê dîwanxanê. Hewa tarî û tarîstan bû. Ronahiya hundurê



dîwanxanê dabû besta biniya malan û best ronahî kiribû. Mîrza Qadir

kete hundurê dîwanxanê û Hevrê jî li ber deri rawesta.

Mîrza silav kir. Emer Axayî bi germî silava wî vegirt û ciyê rûniştinê nîşanî wî da û gote Hevrê :

Qaweyekê ji Mîrza ra amade bike!

Hindî Mîrza pêkutanî kir û got ko qawê navexwe, Emer Axayî nepejirand û destûra qaweyek taybet da.

Mîrza li ser çokan li pêşberî Emer Axayî rûnişt û kaxet û qelemên xwe

danî ber xwe û li nav çavên Emer Axayî nihêrî. Emer Axayî tama devê

xwe xweş kir û got:

Mîrza tu yê nameyek nehînî ji min ra binivîsî! Tikaye ji devê te ra dernekeve. Nîveka min û te da berê Xudê û paşê jî ev xencera.

Vêca destê xwe li tetika xencera xwe da. Tetika xencera wî li ber ron-

ahiya çirayê çilvilî û tirîşkên wê li nav çavên Mîrzayi da rûniştin.

Emer Axayî qisên xwe domand û got:

»Li devê te ra dernekeve ha! Tu yê evê namê ji Mîrê Ereban, Mîr Elî si-

warani ra binivîsî.«

— Başe ezbenî. Fermû, ka ezê çi binivîsim?

— Binivîse! Birayê delal û ezîz... na, na, wisan nabe.

Mîrza Qadir hê tiştê nenivîsibû.

»Binivîse, Begê bi nav û deng, mîrê mîran, mîrê kurdan û Ereban, Mîr

Elî Siwaranê hêja! »

Te nivîsî?

267

BILÎCAN

Bû çîreçîra qelema Mîrzayş û li ser kaxetê da hevraz û berjêr û rast  
û çep  
û qîloqaco bû.

— Fermo ezbenî!

» Binivîse. Ez gelekî te silav dikim! Destên te yên pîroz bi germî digivêşim û li ser serê xwe datînim. Rast e ko ta niha ew bextewariya nebûye

para min ko ez li nêzîki da bigîjim xizmeta we, lê min nav û dengê we bi-

hîstiyê. Xudê lêxoşbûyên bavê min û bavê te her tim li oxira Istembolê da

bi hevra diçûne dîwana dewletê. Berê da hat û çûya wan hebû.

Vaye ez digel vê namê diyariyeke biçûk ji we ra dişînim. Hîvîdarim bibe cîhê pejirandina we...«

Te nivîsî?

— Erê ezbenî.

Binivîse! »Min bihîstiyê ev demaneke ko lawên Hesê Dûdêyî bêemekiya we dikin û çend mal dane dû xwe û ji êla we qetiyane. Li xwe bayî

bûne û pozên xwe quloz kirine û we dihizirin ko mêr li ser wan ra ne-

hatiye. Vê derê jî xwarzayên wan li bêemekiyê da kişandine wan.

Ew jî

çend malên wekî xwe dane ser xwe û vira wekî xalanên xwe dawa  
axatîyê

dikin û dijî me rawestan e. Eger ev yeka li van xal û xwarziyana  
bimeşe,

yê li nava giştî hoz û êlên dî da jî teşene bike û êdî ne axatî dimîne  
û ne jî

mîrtî.

Li vêderê Emer Axayî serê xwe xurand û ji Mîrza Qadirî pirsî: Te ta  
vi-

ra nivîsî?

— Erê ezbenî vaye dinivîsim.

— Erê binivîse.... te çî nivîsî?

— Êdî ne axatî dimîne û ne jî mîrtî.

Erê binivîse! Binivîse! »Min li vê derê ji wan ra teleyek veniye. Ez  
wan

li ser te da dişînim. Min ji wan xwestiye ko eger mihîna Bilîcan bi şer  
û

lêdan ji min ra bînin, ezê qîza xwe bidime wan. Tu jî li wê derê curekî  
bike, xalanên wan bi şer berde pêşîra wan û belkû herdu destê li  
hev bidin

û bixwe xwe bi destên hevdu bêne kuştinê û li serê rêya me radibin.

Vêca

hînga ez jî rizgar dibim û tu jî vedihisî û êdî kesekî dî nikare li dijî  
berjew-

endiyên me biqilqile. Ez her dem li xizmeta te da me.«

Birayê te yê biçûk Emer Axa

Te nivîsî?

— Erê ezbenî.

— Ca carekê li serî da ji min ra bixûne.

Mîrza Qadirî li serê namê ra dest pê kir û her çî nivîsîbû, ji axayî ra

268 BILÎCAN

xwend. Emer Axayî bi nîşana pêxweşbûnê serê xwe hejand. Mîrza Qadir

jî dîsan çavek li ser û binê namê gerand û rabû ser piyan û name da destê

Emer Axayî. Emer Axayî jî li ser û binê namê nihêrî û destê xwe kire ber

şûtika xwe û tûrikekî biçûkî çermîn deranî. Helboqa derê tûrikî vekir û

mohreka zer lê deranî û da destê Mîrza Qadiri û gotê :

— Hanê mohra min jî lê de û bi ser û ber nivîştî bipêçe.

Mîrzayî mohr û name ji destê wî vegirt û binê namê mohr kir û mohir

dîsan da destê Emer Axayî û name jî bi ser û ber nivîştî pêça û ew jî da

destê wî.

Emer Axayî gotê zor sipas. Destên te neêşin. Lê Mîrza wekî min gote te

ha, ji devê te ra dernekeve!

— Nexêr ezbenî, ji solika xwe ra bêje!

— Kuro Hevrê! Be qawa te amade nebû?!

Hevrê sêniya qawê li ser destan hate hundurî. Pêş da sêniya qawê li ber

Emer Axayî girt û li dû ra jî li ber Mîrza Qadirî. Mîrza Qadirî bi lez çend

fir li qawa xwe da û rabû ser piyan. Serê xwe xwar kir û destê xwe da sîngê

xwe:

— Ezbenî we çi xizmetên dî çineye?

— Na, zor sipas! Kuro Hevrê Mîrza derbas bike! Pê ra ta ber derê wan

here û bizivire were vira!

— Baş e ezbenî!

Hevrê û Mîrza li konî derketin. Derva hewa lap tarî bibû. Li ber piyên xwe nedidîtin. Korekor û bi pêxişik ber bi mala Mîrzayi xişikîn. Piştî de-

meke kurt Hevrê zivirî hundurê dîwanxanê û li ber deri rawesta û got:

Fermû ezbenî!

Emer Axayî nama nivîstkî li nav destên xwe da hevraz û berjêr dikir û

pê dilîst. Dema ko çavên wî bi Hevrêyî ket, gotê:

— Were vira! A, were li vêderê rûnê û baş guhdariya min bike, kanê ez

ji te ra çi dibêjim. Tu dê sibê zû, hê istêrka sibêdê ser nedayî li hespê qule

siwar bibî û rê bikevî. Evê namê tu yê li ber qeta kolozê xwe da veşêrî û

ber bi beriya Şengarê bikudînî. Her ciyên ko te rê nenasî jî, tu yê ji rêvî û

rêbwaran bipirsî. Li Kurdistana jêrîn hemû Mîr Elî Siwarani dinasin.

He

tu navê wî bînî, yek na, dehikê nav û nîşanên rê ji te ra bêjin. Tu yê  
rojê  
bêxî şevê û şevê jî bêxî rojê. Divê ko tu li nava mehekî da xwe bi  
mala Mîr  
Elî Siwarani ra bigehînî û evê namê bidî destê wî. Tu li rê da gîro  
bibî, ez  
dizanim û tu. Wekî caran bibe rêvîngê sivik û ber bi beriya Şengarê  
bikudîne.

269

BILÎCAN

Hevrê destê xwe dirêj kir û name ji destên Emer Axayî vegirt û li ber  
qetên kolozê xwe da veşart.

Vêca Emer Axayî destê xwe kire kûrika xwe û kîsikek tijî pare deranî  
û

raberî Hevrê kir û gotê:

— Van jî hilde li rê da pêdivî dibe. Xurcika xwe jî li nan û pêxwarinê  
dagire. De here, hê stêra sibêdê ser nedayî li rê bikeve. Wisan bike,  
bila

kesek jî bi te nehese, ha!

Hevrê kîsikê paran jî ji destê wî vegir û ji cî rabû û xatirê xwe ji wî  
xwest

û li derê dîwanxanê ra derkete derva.

Emer Axayî li dû ra gazî kirê:

— Hê stêra sibêdê li ser nedayî ha!

Dengê Hevrê li derva hat:

— Bilanê ezbenî! Dilniya be!

270 BILÎCAN

35

Li ber derê mala Werdekê bû girmîna duhol û zirçîna zurnayê. Qîz û bûkan bi destên hev ra girtin û ketin dîlanê û govend giran kirin. Ker û

Kuliki giştî ridênsipî û giregirên êla xwe li konê xwe da top kirine. Mêvandariyeke giran danîne. Lokoyê Begzade û Elikê Mirtiv bi dengê

duhol û zurnayê bûk û qîz û xortan didin leystinê. Li ber derê mala Werdekê deng û hera ye. Helperkê û dîlan e. Giştî komela zoma Werdekê demsaz û keyfxweş bûne. Emer Axayî serê xwe ji xwasta serek-

zomeyên wan ra xwar kiriye. Ewî bixwe bi destên xwe qîza xwe ji serek-

zomeyê wan ra şanî diye. Ev yeka ji wan ra serefrazî û şanaziyeke pire

mezin û bayexdar e. Her yekê bi kiriyarekê keyfxweşiya xwe radigehandin.

Giştî ridênsipî û konemêran berev bûne û li bara çûyîna Ker û Kuliki da, li bara rê û dirban da, diaxivin. Ker li serê jorê rûniştiye. Tevir simbêlê

wî nabire. Qudetiyê lê dest daye. Xwe pîp kirî ye. Li nava bokeberanên

hozên heşt bavan da kesî newêrî fîncana feyfûrî li ser masê hilîne. Ewî hi-

lanîbû. Li hemûyê giringtir Emer Axa neçar mabû, serê xwe ji daxwaza

wî ra xwar bike û qîza xwe jê ra bi bûkînî bixemilîne û bişîne mala wî.

Waye koma konemêran çek û rextên Ker û Kuliki raxistine nîveka konî

û li çawaniya wan dinêrin. Kêmasiyên wan ji la dibin. Her yek tişteke dibêje:

— Devê vî şûrî mirov dibêje qay tiştekepaxsê xwe avîtiyê.

— Ev sîngiya kûşkê giran e.

— Ev rima li destan xweş nîne. Ewa han baxweştir e.

— Ev nêzeya mirov dibêje qay hemmanê tewiya ye.

— Tîrên we kê mînin?

— Hûnê xwarebarê çî ji xwe ra biherin.

— Hûnê hema tenê herin?

Her yekê pirsiyarek dikir û her yekê dîtin û peşniyazek radigehand. Gava ko pirsaxwarebar û hevalan hilket, Kerrî kolozê xwe tele danî û got:

Emê barê heft hêştiran xwarebarê bi xwe ra bibin. Ya hevalan jî her

271  
BILÎCAN

çend ko dilê min dixwast, ez bi heyta hût û bi leşker û esker biçûyama,

lê rê dûre û demsal jî havîn e. Havîna beriyê jî pir germ e. Ezê her sê çar

hevalan di gel xwe bibim bese. Ezê Lokoyê begzade, Elikê Mirtiv, Hasûxan û Pasûxanê Êzdî, Buxdo û Êxoyê file û yek jî Evdurehmanê Terikî di gel xwe bibim. Herdu begzade ji bona duhola hawarê û miqamê



şerine. Li meydana şerî da bila ji me ra li miqamên mêraniyê bidin.  
Evdurehmanê Terikî jî ji bo aşpêjiyê. Ew berpîrsê xwarebarêye.  
Hemîn  
Hasûxan û Pasûxanê Êzdî jî meyerin. Ewan li ser xû û xideyên  
hespan  
ketine û bila ewan jî digel me bîn. Buxdo nalbend û beytare. Êxo jî  
hos-  
ta ye. Li rê da şûrek, tîrek pêdiviyî me dibe. Du, sê siwaran jî Emer  
Axayî  
got, ko ezê li gel we danêm. Dîsan jî dilê kê dixwaze, bila li gel me  
bê.  
Gava ko Kerrî got, dilê kê dixwaze bila li gel me bê. Kiztîn ji çi kesî  
ne-  
hat. Hemûyan lalome girtin û serên xwe kirin ber xwe da. Hemûyan  
kumên xwe ber bi asimani diavîtin, ko Kerrî navê wana neaniye.  
Hemûyan dizanîn ko ew rêka, rêka hat û nehatê ye.  
Piştî şîvan bereviya Kerrî belav bû. Ker û Kulik, Evdurehmanê Terikî,  
Lokoyê Begzade, Elikê Mirtiv, Hasûxan û Pasûxan tenê li konî da  
man.  
Kerrî berpîrsiyariya her kesî destnîşan kir.  
Şev dageriyabû. Her yek hema li goşeyek konî da servekirî  
veleziyan.  
Ker jî li ber evîna Perîşanê erd û esman wî ya nahebîne. Hindî ko  
bervî  
belaw bûye, eve sê çar car e ko Macan hatiye ber derê konî û  
hejiyare daye  
wî, ko Perîşan li xîveta taybete bûkîniyê da bendewarî wî ye. Li cara  
sêyan

da Ker bi neçarî ji konî derket û çû xîveta taybetî. Keniz û cêriyan cî  
û  
nivînên taybete bûk û zavatiyê ji wan ra danîbûn. Hemûyê bi tilîlî  
Ker  
ber bi xîvetê birin û pişta xwe dane wan û ewan tenê li xîvetê da  
hêlan.  
Perîşan li ber şabûna evînê dilerize. Ber bi Kerrî hat û xwest ko  
destên  
xwe li gerdena Ker werîne. Lê Kerrî gotê:  
— Perîşan! Roja îro tu li mala min da weke bisparteyekêyî. Min ji  
bavê  
te ra gift kiriye ko divê ez jê ra Bilîcanê bînim, paşê qîza wî bi helalî  
bixwazim. Vêca şûrê xwe li ber xwe kişand û danî nav nivînan û got:  
Li  
nîveka min û te da ev şûra bend û bersivdar e.  
Hindî Perîşanê xwe li ber da qelizand û xwe nazand, Kerrî  
nepejirand  
û kete nav nivînan û şûr li nîveka wî û Perîşanê da, pişta xwe dayê  
û kete  
xewê. Perîşanê jî hindî xwe vî alî, wî alî firikand, dîna xwe dayê ne  
herê  
Ker ew mêra nîne ko li ser gifta xwe bizivire. Ewê jî bi neçarî pişta  
xwe da  
Kerrî. Lê ta sibêdê xew li çavan neket. He seranserî şevê li bara  
çûyîna wî  
da, li bara buvedariya wê rêkê û wê telbenda ko bavê wê ji berdilkê  
wê ra  
272 BILÎCAN

venîbû, hizirî.

Hê stêra sibêdê ser nedabû ko Lokoyê Begzade û Elikê Mirtiv li duho-

la hawarê dan. Bi dengê duholê ra, cotên pehlewanan di gel heval û

hevrêyên xwe, xwe tev girêdan. Perîşan jî bi koma keniz û heval û hogirên

xwe va li ber derê xîveta xwe rawestabûn û li koça herdu pehlewanan

dinihêrîn. Barê heft hêştiran xwarebar dagirtibûn. Kelmelên dî jî li du

hêştiran kiribûn. Gava ko barên hêştir û hêştiran hate lêkirinê, Ker û

Kulik tevî hevrêyên xwe li hespên xwe siwar bûn. Perîşanê bi çavên hêsir

li dû wan ra gazî kir:

»Ji we ra oxir be! Banê bilind piştewanê we be! Ker zû bizivirin ha! Çavên me li rêka xwe neqerimînin! Me çav li rê nehêlin!«

Kerrî bi hevalan va bersiva Perîşanê weha dan:

»Bi xatirê we! Bimînin di xweşiyê da!«

Koça kurên Werdekê bi dengê duhola hawarê ra ji zoma Werdekê ber

bi zoma Emer Axayî rê ket. Hê berê sibêdê gewir nebibû, ko bi mala Emer Axayî ra giheştin. Emer Axa û Eyşan Xatûn jî rabibûn û li ber derê

konî rawestabûn û çavniherî hatina kurên Werdekê bûn. Gava ko Ker û

Kulik giheştin ber derê dîwanxana wî, Emer Axayî gazî kir:  
»Ji we ra oxir be! Vaye hevaleyê we jî li vir e. Neimetê kurmamê we  
xwe  
amade kiriye. Duhûnê va, ji bona we netebitiye. Dibêje ezê jî  
kurmamên  
xwe ra herim. Neimet mêrekî bi xîret e. Şûrkêşê we ye. Li Neimeti  
miqat  
bin ha.«  
— Baş e! Baş e!  
Bi dengê duhola begzadan ra, tev li rê ketin.  
Eyşanê li dû wan ra got.  
Ca dîna xwe bidê! Tu dibêjî koça qereçaye. Yê bi vê qûnê here ji me  
ra  
Bilîcanê bîne. De herin, çûyîn ya we be, hatin ne ya we be!  
Îca milê xwe li milê Emer Axayî da û tev çûne xîvta xwe ya taybetî.

273

BILÎCAN

36

Hê koça kurên Werdekê li ber çavên Perîşanê wenda nebibû, ko  
Perîşanê  
nameyek ji Werdekê ra nivîsî:  
Dayîka Werdek!  
Porên serên min û te tev da kur bin! Tu li zozana Sardewaran çi dikî?  
Bavê min herdu kurên te xapandin û bi şer li ser xalan da şandin. Zû  
bike  
û bilezîne xwe bi cotên kuran ra bigehîne û wan li ser vê oxira ne bi  
xêr

bizivirîne. Ez destên te radimûsim.

Bûka te Perîşana Emer Axayî.

Perîşanê name weke nivîstekê pêça û rûyekî mûşima lê wer kir û ew

kire nivîşt û çend morî û çavhişink jî pê va kir û kire skura Macanê.

Destek cilkên mêran li Macanê kir û ew li Şînê Xalxalî siwar kir û bi gef

û gur ber bi zoma Husên Paşayî şand.

Macan bû ba û birûsk û berî êvarê xwe bi zozanên Sardewaran ra ge-

hand û nama Perîşanê da destên Werdekê.

Taze tav tijî cîhanê bibû ko Werdekê wekî hirçeke birîndar xwe bi zoma kaniya Rihanê ra gîhand. Dîna xwe dayê kurên çî! Halê çî! Mêj va

ye ko Ker û Kuliki zome cî da hêlane û bêy xatirxwastina wê ber bi beriya

Şengarê çûne jî. Perîşanê jî weke bermaliyeke kirarî xwe daye ber malê.

Rikêfî ser Perîşanê kir. Perîşanê xwe avîte ser dest û piyên wê û gereyan jê

ra bi hûrgilî şirove kir û ew ji pîlanên bavê xwe dijî cotên kurên wê agadar

kir. Werdekê taze zanî, ko ew mêvandariya wê jî, her pîlanek bûye.

Gava ko Werdek giheşte mala xwe û bi gereyanê agadar bû, zû ferman

da, ko jê ra mahîna Barxane zîn bikin.

Gotinê:

— Tu qirik nebî, her gava ko kurên te li rê ketin, Emer Axayî siwarên

xwe şand, hatin dar û nedarên te, keriyên pezên te, revoyên hespên  
te, bi

berhana wê hindê ko malêm zavayê wî bêxudan nemîne, top kirin  
û

kişandin birin ser mala Emer Axayî.. Werdek li ber kerb û hêrsan va  
hindik mabû ko şêt bibe. Bi gef û gur hajote ber derê mala Emer  
Axayî.

Hey wî wî hey wî wî ...

Werdek dike dilezîne...

274 BILÎCAN

Wekî hirça birîndar e, li ser kudikan dilorîne û dizarîne...

Bi gef û gur xwe li der mala Emer Axayî ra digehîne...

Li ser Emer Axayî da dike gazî û qûtîne...

Dibêje Emer Axa tu yê xêrê bikî, wayê qet nebînî...

Tu yê kirikê sor biçînî, ziyana tal li dewsê hilînî...

Tu yê çi caran dergûşa kurîn li himbêza xwe nebînî...

Kê li dewr û demanan dîtiye, mirov berxên sawa li kozikê derîne...

Bi şer li ser qerteberanan da bişîne...

Kê dîtî ye, mirov xwarziyan bixapîne...

Bi dexesî li ser xalan da, bi şer bişîne...

Şerê xal û xwarziyan wisane, bînanî rîşa kotîbûnê, derman jê ra qet  
tunîne...

Dexeso! Nekeso! Xinizo, xayîno, tu nemînî,..

Zû bike zû bilezîne...

Ji min ra mahîna Barxane bîne...

Werdeka porkur dike here cotên kuran li ser vê oxira ne bi xêrê  
bizivirîne...

Hey wî wî hey wî wî... şêrên min nezanin...

Nezanên neguhdar in, pir cewan in...hey wî wî...

Bi qûtîna Werdekê ra Emer Axa derkete ber derê dîwanxanê û pirsî:

Kuro ew kî ye? Çi dibêje?

Gotinê:

— Werdek e. Bi şer hatiye û mahîna Barxane dixwaze. Dibêje ezê dû

kurên xwe bikevim.

Emer Axayî got:

Kuro çî dixwaze bidinê bila ew jî here û neyê.

Meyteran di gavê da mahîna Barxane ji Werdekê ra amade kirin.

Werdek li mahîna Barxane siwar bû û bînanî bayê bezê li dû kuran ket.

Ew du roj bûn ko koça Ker û Kuliki yekbîn dajot. Roja sêyê nîveka nîvro û êvarê bû ko Kuliki dîna xwe dayê dûmanek waye li ser rê ketiye.

Reşek waye bînanî bayê bezê li dû wan ra tê. He destî niqitî dilê wî ko

Werdeke li peyê wan ketiye. Ker ko li pêşiya koçê bi gef û gur dajot û hay

ji bayê felekê nibû, Kuliki bi deng weha lê qûtand:

Lolo Kero malşewtiyo, deşta Heranê darên bîne...

Birayo hêdî bajo nelezîne...

275

BILÎCAN

Ca gavekê dizgîna Sosikê hilkişîne...

Hemet bajo, lezê neke, nekudîne...

Li pişt serê xwe ra mêze bike, wê dûmana han bibîne  
Bi min wereng ew dûmana hanê ko ketiye terqa rê ye...  
Ne baye, ne babirûske, birayo Xudê kem pîra dê ye...  
Neçe bila şîrê xwe li me helal bike, ji mer ra bide salixê rêye...  
Kero bira bêdiliya Werdekê neke, bila felek û oxirên me lev bê ye...  
Ker ko ji bilî beriya Şengarê û hanîna Bilîcanê û evîna Perîşanê li bara  
çi  
tiştên dî da nedihizirî û ji bilî wan çi tiştên dî li ber çavan ra nedihat  
û  
nediçû, xwe li Kuliki pert kir û gotê:  
»Birayo niha da çavên te reşkopesko lê didin. Ka reşê çi! Dûmana  
çi!?  
He Xudê Werdek be jî, ez narawestim. Xudê neke Werdek be. Eger  
Werdek bê, dê me gîro bike û nehêle em rêka xwe bidomînin. Eger  
ew  
be, dê bê li ber me bixûne û bêje neçin. Xudê dilê te jî naxwaze tu  
digel  
min bêy. Min pêş da jî gotiye te. Eger tu hez nakî, bizivire here mal.  
Ezê  
her tenê herim Beriya Şengarê.«  
Vêca devkî neçû serî û bi stiran weha gote Kuliki:  
Lolo Kuliko, deşta Heranê darên bîne...  
Min pêdivî bi te û biratiya te çunîne...  
Kuro tu niha da bicî, dil û gurçikên te peritîne...  
Tu qet dola Silêmanî nînî, kê dizane ka Werdek te ji kû tîne...  
Kuro biteqize here li mal da tu bimîne...  
Weke kûrê kurmî li ber tendûrê rûnê kûtan bixoyê, bişêkirîne...  
Ezê tenê herim beriya Şengarê, talaşa min ji kesî nîne...



Bi van dujînên Kerrî ra, Kulik bi tundî sincirî û weha bersiva Kerrî da:  
Kero bira deşta Heranê darên bîne...

Meriv van keviran li birayê xwe naxîne...

Kuro day û bavê me yekin, cudayiya me tunîne...

Dema ko em daketin herafê meydanê tu yê bi çavên serê xwe bibînê  
ka

kê ji me diçe, kê dimîne...

Birayo qudetiyê tu girtî, te yê agah ji bayê felekê nîne...

Ev tel e û telbend û davik û pîlan e, Emer Axa ji me ra wê datîne...

Ruhistîn bi rex te ketiye, dema te kuta bûye, ez ditirsm bûka dest bi  
hine, bêxwedî li mal da wê bimîne...

276 BILÎCAN

Ker û Kulik bi stiran devojenê hev bibûn ko Werdek li toz û dûmanê  
da werdayî li ber wan rawesta. Gijik li ser serê Werdekê ketibû. Tozê  
xwe

avîtibû zulf û biskên wê. Porên wê yê riştebirincî li tozê da boz dikir.

Mahîna Barxane li xûyê da sipê çîl bibû. Kef li ser saxiriyên wê ketibû.

Bi

hatina Werdekê ra Hasûxan û Pasûxan, pêşiya hêştiran rawestan.

Koça

kurên Werdekê li serê rê bo cara yekê bêhna xwe veda. Hemû çît  
rawest-

abûn û guhdarî li got û bêja Werdekê û kurên wê dikirin. Hêştir û  
hêstir

û hesp bi siwaran va hemûyan berê xwe zivirandin û li Werdekê û  
mahî-

na Barxane nihêrîn. Gava ko Sosik û Nijdî mahîna Barxane dîtin, tev

şîhiyan. Te digot qay bi dîtina pîremaka xwe şa bûn. Mahîna  
Barxane jî  
weke birûskeke şîhiya. Hêştiran bi çavên beloq û nihêran li  
Werdekê û  
mahîna Barxane mêze dikirin. Ev sê roj û sê şeve, yekbîn rê hatine.  
Bi  
rawestandinê ra, pêroyan hemûyan ava xwe rijandin.  
Werdekê li Ker û Kulik heyvand û gote wan:  
Lawo dilê min qubar nagire ez bêjim we, emekên berên min, li berê  
çavên we bigire. Şîrê min li we heram be. Kurên min eva yeka çi bû  
we  
kir. Hûn çima li ser şîrîta nêmerdan dilîzin. Hûn çima li ber bayê  
Emer  
Axayî ketin û bi wî xapiyan. Ev tele ye, ko ewê dexes ji we ra daniye.  
Lawo  
her min dikarî yan bi zor, yan jî bi qelen, Perîşan ji te ra bixwesta. Ez  
li  
mal nebûm, we bêy min çû ev yeka han kir. Lê lawo we qet negot,  
pîre-  
dayîkek me haye, bihêle em bişînin peyê wê , bila ew bê, em şêvrê  
pê  
bikin paşê. Ew jî hê qet. We bêy min çû xwe kire telika Emer Axayî  
da,  
her we teterek bişanda peyê min û xatirê xwe ji min bixwesta, paşê  
hûn rê  
ketana. Kurên min! Ma Bilîcan bergîreke bêxudan e, hûn ketine ser  
hu-  
likên Emer Axayî, hûn herin ewê bi şer û lêdan ji Emer Axayî ra bînin.

Werin bi gotina dayîka xwe bikin û li vê oxirê bizivirin.  
Kerrî bi istiran ji dayîka xwe ra weha got:  
Dayê nabe, Xudê kem nabe...  
Vegera me li nîviya rê da çi car nabe...  
Tîra ko ji kevanî derket, dîsan li ser jehî da nazivire, ra lê nabe...  
Eger em li nîviya rê da bizivirin, xelkê bêjin, Keroyî tirsenoqe, Kulikî  
tişt pê nabe...  
Êdî serê me yê li nava xelkê da qet ne rabe...  
Hînga îca dostê bikevgirin, dijminê li me şabe...  
Dayê nabe, çi car nabe, xebera xwe zehî neke, vegera me li nîviya  
rê da  
çi car nabe...

277

BILÎCAN

Vêca li dû ra bi ken û devkî gote Werdekê:  
»Dadê min li nava hozên heşt bavan da rusva neke. Min taze qawa  
mer-  
can vexwariye. Ez ji kuştinê ra jî li ser vê oxirê nazivirim. Tikaye me  
gîro  
neke, rêka me dûr e. Ka eger gotinên te yên dî tunebin, emê rê  
bikevin.«  
Werdekê xû û xideyên kurê xwe dizanî. Dizanî gava ko Kerrî zîn li  
biz-  
inê kir, cîhan tev jî biheje, nikare ewî li ser mebesta wî bizivirîne.  
Serê xwe  
kire ber xwe û got:

»Kero niha ko te herdu lingên xwe kiriye solikeke teng da, ez dizanim,  
tu yê her bi ya xwe bikî. Lawo her layê kê m rawest e ez çend şîretan li we bikim û salixên rê û dirban ji we ra bidim paşê herin. Lawo eger we şîretên min kirin guçkên xwe da, hûnê li vê oxira xwe da li ser bikevin. Lê wakî we pê li dînê min kir û we gotinên min pêpes kir, Xudê kem hûnê tendurust herin û nivîşkan bizivirin.  
Kerrî got:  
»De bêje ka tu yê çi bêjî?!«  
Werdekê bi dilekî kul weha ji kurên xwe ra got:  
Hey wî wî...hey wî wî...  
Lawo hûnê herin li çiyayê qilîç, niha koçer derketine li wan zozanan...  
Xweş tê dengê şivan û bexvan û wan gavanan...  
Tê kalîna berx û mîh û barîna kar û bizin dengê berodanan...  
Galegala pincarçin û bêrîvanan...  
Zarezara dengbêj û bilûrvanan...  
Nalanala dilbirîn û evîndaran...  
Hokehoka revîvan û hêştirvanan...  
Lawo hêştirên koçeran belav dibin li wan beyaran...  
Li peyê hêştiran digerin kudikên şîrmij weke zaran  
Hûn û Xudê û habînan, kudikên hêştiran ser jê nekin hûn çi caran...  
Lawo hêştir timî tim li nava qîfaran da ew dimînin...  
Li nava qîfaran da, qîfarên jahrî wê hêştin...  
Qîfarên jahrî yê li hêt û saxiriyên hespên we ra herin, tê da wê

bimînin...

Yê paşê kê m û edab bigire, bibe kewnebirîn, jehrê li bedena hespên  
we

bigerînin...

Hespên we yê zarincî bin, hûnê li nava xelkê da peya wê bimînin...

Lawo li dû kudikan nekevin hespên xwe newestînin....

Kudik guneh in, wan çî caran ser jê nekin, neêşînin...

278 BILÎCAN

Çî caran kudikan ji makan hûn neistînin...

Hûn û Xudê çî caran destên mak û kudikan ji hev neqetînin...

Çawa ko Emer Axa û Eyşan destê min û we jê diqetînin...

We xeşîman bi şer li ser xalan da wê dişînin...

Hey wî wî.....şêrên min nezan in, neguhdar in hey wî wî..

Kerrî got:

»Dayê ev yek!«

Werdekê dest pê kir benda duyê weha ji wan ra got:

Hey wî wî ....

Lawo hûnê herin beriya Şengarê germ e germistane...

Besta bê ave, xîze xîzistan e...

Xîza hûre li ser çîpên wan hespan e...

Tûmên hewşanê tek û tûkan li dûr va tên xûyan e...

Hey wî wî hey wî wî...

Lawo hûnê herin berî evaran bakê li we rabe...

Tûmên hewşanê dê li ber babe...

Dê bibe şingîna kara xezalê li ber rabe...

Lawo bila şîretên min pîredayê li guhên we da be...

Li dû karên xezalan nekevin, karên xezalan bêwayîkin, li dû kuştina

karên xezalan ra kes mirazê xwe şa nabe...  
Hey wî wî hey wî wî...  
Kero lawo wa nabe, delalo wa nabe, Xudê kem qet wa nabe...  
Her çend ko hespên we bezan e, kara xezalê li ber xelas nabe..  
Lê kara xezalê dê besta xîzê xelas bike, ber bi kevirên çeqmaqan da  
ew  
duta be...  
Kevirên çeqmaqan tûj in, nalwejen in, simên hespan dibirin, bi zede  
dikin, simê wana çi caran serast nabe...  
Hûn û tîra rojê, hûnê li peyê karên xezalan nekevin, simên hespên  
we  
yê zede bigirin, li rojên qawimeqûtên giran da, li meydanên şeran  
da, li  
hawarî û gaziyan da, yê we li erdê bihêlin, dostê bigirîn, dijminê li  
we şa  
bin...  
Hey wî wî hey wî wî...  
Kerrî got:  
Dayê ev e dudu!  
Werdekê dîsan dest pê kir, şîreta sêyan weha li wan kir:  
Hey wî wî hey wî wî...  
Lawo dil û cergê minê pir bi kul û tev birîn in...

279

BILÎCAN

Hûnê herin kaniya rêvînga, li ser gola Eynolhayê şev bimînin...  
Hûnê bikevin xewê, xew û xewnên westiyayan pir şirîn in...  
Nijdî û Sosikê qeyd û bendan biqetînin...

Ewanê pê avên golegeniyân wê bimînin...  
Îca hûnê li nava dijminan da peya bimînin...  
Hûnê dilên dostan biêşînin, dijminan bi xwe bikenînin...  
Hey wî wî hey wî wî...  
Gava ko Werdekê navê gola Eynolhayê û kaniya rêvîngan û golegeniyân hanî, Neimeti guçkên xwe beliqandin û gotinên Werdekê li ber  
xwe da dupate kirin: Golegenî, golegenî. Gola Eynolhayê, Gola Eynolhayê...  
Werdekê her sê şîret li kurên xwe kir û dizgîna mahîna Barxane zivirand.  
Kuliki gazî kirê dayê tu û Xudê ca neçe! Dema ko em li mala xalên xwe  
hatin, em zaro bûn. Baş nayê bîra me. Hînga malên wan li Şengarê bû.  
Gelo niha jî malên wan li wir danîne yan warên xwe guhestin e. Yek jî ev  
a demanekî pir dirêj e me xalên xwe nedîtine. Me reng û rûyên xalên xwe  
ji bîr kirine. Ca bi dilovaniya xwe nîşanên xalên me wargehê wan ji me ra  
bêje, paşê here!  
Werdekê serê mahîna Barxane li ser wan da zivirand û dîsan her bi sti-  
ran ji wan ra weha nîşanên xalên wan şirove kir:  
Hey wî wî ....  
Lawo ezê ji te ra bêjim nîşanên xalan baş li bîra xwe da tu hilîne...  
Êla Eliyê Siwaran hefthezâr û heftsed mal e, li ber çemê Mûsilê ew

datîne...

Konên xalên we heft hebin, dûrî wan li girê kolotan da wê vegirtîne...

Her tim li ber derên konan ew rûniştîne...

Serguhên wan li ser hawarî û gaziyan wê dimîne...

Mehnegiyên wan bozên xalxalîn e....

Zîn kirî û amade li hêşiyên konan da tewldayî ne...

Rimên wan li jehriya marên reş da kildayî ne...

Li ber derê konan da şêlandî ne...

Lawo kumên xalên we kolozên zopin, tiftîkî ne...

Şeirên reşî şivî şivî li dorê alandî ne...

Kurkên wan merezên Hezoyî ne...

Her serikek qelûnên wan doxek tutûna Mûşê wê hiltîne...

280 BILÎCAN

Gava ko hûn çûn Gola Eynolhayê, Qîracê daran, besta berî û berîstanê,

wan pê bihesîne...

Xwe bi wan dengî bikin, bila pişta we bimîne...

Zedeya we li destên wan da nebe, talaşa we ji êla Mîrê Ereban qet tunîne...

Evê gotina Werdekê li tengala Kerrî girt û Ker ji dil êşiya û gote

Werdekê:

»Dayê me bi xalên me netirsîne. Golikên malê ji gayên malê natirsin.

Ez ne talaşê ji êla Mîrê Ereban digirim, ne jî ji heft birayên te. Ez çi caran

serê xwe ji birayên te ra xwar nakim û çi caran jî xwe bi wan nadim



nasandinê. Tu wisan dikî bila sibê birayên te bêjin, em nebana herdu  
kurên Silêmanî tenê nikarîn bihatana beriya Şengarê û ev mêraniya biki-  
rana û mahîna Bilîcan bibirana. Xudê tu lap dilniya be, ez ne xwe bi wan  
didim nasandinê û ne jî dihêlim Kulik xeberekê li ser wan da rê ke.  
Tu hê  
bitirse ko ez bi wan ra hev nexim jî.  
Dilê Werdekê ji vê bersiva Kerrî êşiya. Werdek sincirî. Xûnê xwe da serê wê. Çavên wê reş û tarî bûn. Cîhan lê bû çêrmê cûncikê. Serê wê gêj  
bû, li ber hêrs û tûretî yê weha bi tan û niç li Kerrî zivirand:  
Hey wî wî hey wî wî ...  
Lawo her heft xalên we eluh û di laçîn in...  
Sorên çavhêşîn in...  
Kurdên bavêzdîn in...  
Mêrxasin del û dîn in...  
Xudanên zergê xezebîn in...  
Xweyê xencerên devpane tetik zîvîn in...  
Bi şûr û mertal û kulavqotên asinîn in...  
Serê rimên wana çar tilîkan li jehrê da kildayîn in...  
Serîkî rimên wan li erdêye, serê dî li ber perê asimîn in...  
Çi mêran li ser xwe ra nahebîn in...  
Li ristan diniqînin, li çepan derdixîn in...  
Suwarên mehnegiyên bozên xalxalîn in...  
Dêlên mehnegiyên wana qamçîkîn in...  
Çîpên wan qulingîn in...

Hêtên wan sebedîn in...

Simên wan kodikîn in...

Nalên wan zêrîn in...

281

BILÎCAN

Mixên wan zîvîn in...

Guhê wan kevçîkîn in...

Pozên wan zerikîn in...

Sîngên wan defên derwêşîn in...

Piştên wan zînkîn in...

Navtengên wan tajîkîn in...

Derejoran dimeşîn in...

Serhevrazan dihejîn in...

Meriyan li heft newal û heft nepeniyên digêrin...

Eger tu xwe bi wan nedî nasîn, ewê heft zergan li navmilên te bixînin...

Yê şîrê min dêranê ji pozê te ra bînin...

Dema bi xatirê we lawo sax bimînin...

Hey wî wî, hey wî wî...

Ker li van pesin û tirsên ko dayîka wî lê da, pir nerehet bû. Li ser dayîka

xwe da qîriya û gotê:

Dayê ez Kerr îm, Kerê dîn im...

Mija rû erdê û asimîn im...

Nebiyê Silîv begê kurê Silêmîn im....

Ez lawê te Werdeka dîn im...

Ji maleka xerab nîn im...

Çi mêran li ser xwe ra nahebînim...  
Ji bilî Perîşanê çî kiçan ez nastînim...  
Ezê şeş xalên xwe bikujim, giyanê şîrîn ji wan bistînim...  
Didanê yê biçûk hemûyê bikişînim...  
Ewî dîl bikim, ji te ra bînim...  
Tu nikarî bi du pirsan min bixapînî...  
Xwarziyan ji xalan bitirsînî...  
Li nîviya rê da min bizivirînî...  
Dost û dijminan bi min bikenînî...  
Dayê xatirê te sax bimîne...  
Bûka dest bi hine li hîviya te va dimîne  
Bizivire li rêka xwe nemîne...  
Kuliki dîna xwe dayê Ker bi tundî bersiva dayîka xwe dide. Banzda  
nav  
stirana Kerrî û dengê xwe li ser dengê Kerrî xist û li ser teqil û kêşa  
stirana  
282 BILÎCAN

wî da weha ji dayîka xwe ra got:  
Dayê tu bikî bi xatirê Yezdanê mezin, mishefa reş û şêx Şemdîn e...  
Bila dilê te ji kurên te nemîne..  
Tenê ji me ra bide salixê Bilîcanê, kanê ew çawa mihîn e...  
Rengê wê çawa ye, li kû dimîne...  
Belkî Ker here ewê ji Emer Axayî ra bîne...  
Perîşanê bi helaliya Xudê jê distîne  
Dayê bi xatirê te sax bimîne...  
Here li ber malê, bûka ser bi xêlî li hîviya te dimîne...  
Werdekê keserek kûr rakişand û li bersiva Kuliki da weha got:

Hey wî wî, hey wî wî...

Lawo dilê minê kîn e kîn e...

Serê dilê min kul e, binê dilê min birîn e...

Lawo Bilîcan mahîneke bozeşîn e...

Minê nav û dengên wê li meyteran bihîstîne...

Dibêjin xaleke sipî li ser gurçika wê ya rastê dimîne...

Rojê heft, heşt nobedar li ber sekinîne...

Tenê rojên eyniyan meyter ewê li axura wê dertîne...

Li ser bîra biniya malan, av dide, demekê digerîne...

Lawo ta kû Kero xwe bi xalan nehesîne...

Ker patika xwe dibîne, Bilîcanê bi çavên serê xwe nabîne...

lawo de bi xatirê te sax bimîne...

hey wî wî hey wî wî....

Ker keniya û got:

»Dayê ez destên te radimûsim, ko te salixê Bilîcanê ji me ra da. De bi

xatirê te.«

Vêca bi vê gotinê ra li Hasûxan û Pasûxan heytrand û got:

Kuro pêşiya pêroyan berdin. Dereng e. Em gelekî gîro bûn. Îca digel gotina xwe serê Sosikê ber bi oxir kir. Werdekê jî kor û poşman patika

xwe xurand û serê mahîna Barxane li ser rêka xwe da zivirand.

Mahîna

Barxane dil nedikir, li cotên caniyên xwe biqete. Werdekê mahmizek lê-

da û ew ber bi rê zivirand. Bû şîhîna mahîna Barxane û kete rê. Li dû ra

herdu caniyên wê jî şîhiyan. Hê koça Ker û Kuliki rasterê nebibû ko

Werdek li nava toz û dûmanê da li ber çavan wenda bû jî.

283

Werdek bi dilekî kul û serekî pir bi dûman li cotên kuran qetiya. Agir  
li

serê wê ketibû. Çi tişt li dest wê nedihat. Der û deşt û çil û çiya ji  
xwe ra

dijim û neyar dizanî. Eger bikarîba, yê hema niha yeksere bajota ber  
derê

mala Emer Axayî û hêrişî ser wî bikira û ew bida ber şûran. Lê her  
çend

ko bi hêza mil û baskên xwe va qerah bû jî, tenê bû. Pêşyan gotine  
destê

tenê bêdeng e. Siwarek tenê tozê ranake. Bi xaran dajot. Çavên wê  
li ber

kerb û kîne reş û tarî bibûn. Li ber piyên xwe nedidît. Li cîhana bîr û  
hizrên aloz da bû. Meydana şerê xwe bi xwetiye bi çavên serê xwe  
didît.

Dihate ber çavên wê ko kurên wê û birayên wê çawa li ber hevdu  
vedipelişin. Çawa li ciyekî bêtune, li ser tûyî tune xûna hevdu  
dirijînin û

meydanê ji Emer Axayî û yên wekî wî ra fire dikin. Şerê xal û  
xwarziyan,

şerê xwe bi xwetiye, rîşala kotîbûnê, kula neman û ji navçûnê bi çav  
didît

û ji dil dinalî.

Şingîna rîman, xuşîna şûran, givegiva tîran, nalenala birîndaran li  
nav

serê wê da deng vedida. Xûna sor li ser herdu kurên wê û her heft birayên wê ketibû. Termên xal û xwarziyan li meydana şeri da rêz li ber hev didît.

Nizanî yê pêş da li ser kîjanê bigirî. Li ser termên cotên kuran, yan li ser termên her heft birayan. Ev term ji bo çî ketine. Ji bona çî ev hemû mêrên me, ev hemû kurên me, ev hemû birayên me bi destên hevdu têne kuşt-inê. Her tenê ji bo berjewendiya dijminê gel û welat e. Ji bo wê hindêye ko axa û begên weke Emer Axa ko bi destên bîhaniyan hatine li ser sku-ra gel siwar bûne, bi sanahî û li xweşiyê da bijîn. Rastî Ker û Kulikê wê ji bo çî ketibûn rê. Axo bona evîna Perîşanê bû. Ne Perîşan wa hatibû li mala wê da rûniştibû. Bêhişiya kurên wê bibû heger, ko Emer Axa bikare ji wan behre û kara ne li cî da vegire. Ewan wekî bûkilan li destên xwe da bireqisîne. Li rêyekî digeriya ko vê gîrodariya mala xwe çareser bike. Lê çî rê û çare nedihatin bîrê. Yê ko da biçûya û gazindên xwe bi kê bikira. Hindî dihate bîrê her temenê wê û kal û bavên wê û mêrê wê li şer û cengên xwe bi xwetî yê da bêçine bihorîbû. Bixwe ji devê

Xudêlêxweşbûyê Silêmanî bihîstibû ko bavê wî Eliyê Silîv begê bi destên

284 BILÎCAN

dexesan hatibû kuştinê. Hindî dihate bîrê û hindî ko mezinan ji wê ra sal-

ix dabûn, her mêr û mêrxasên wan bi destên hev, bi pîlanên dijminan

hatibûn kuştinê. Şer her şerê xwe bi xwetiye bû. Kîjan rûper ji mêjûya gel

û welatê xwe vedikir, rastî pîlanên neyaran û şerên xwe bi xwetiye û hev-

du kuştina kal û bavan dihat. Bixwe jî bibû hegera mirina gelek pehlewan

û xweşmêran. Gelek pehlewan jî li bin daxên wê da derneketibûn. Gava

ko ev yekana hate bîra wê, beda wê ji xwe û ji hemû kesên ko dibin hegera

şerên xwe bi xwetiye hat. Lê nizanî ye çî bike. Çî tişt li destên wê nedihat.

Li cîhana bîrên tal û aloz da bû, ko dengk li ber guçkên wê ket. Dîna xwe dayê, ko dîwane Cindî waye Postekî pezkûviyan avîtiye navmilên

xwe. Keşkûla wî li mili da, telbika wî li desti da, siwarê qure bergîrê xwe

bûye û beyta Las û Xezalê dixûne û bi miqamê wê ra li telbikê dide û ber

bi wê tê

Dîwane Cindî yekî reşî qirtîş, çîlaçîzkî, qorî qoq û bejinbuhostî bû.  
Ridîna wî ya reşe zîl ta ser sîngê wî dihat. Ewî her dem porên serê  
xwe bî-

nanî keziyên jinan vedihûna û li dora serê xwe dialand. Mirovî ko li  
dûr

va lê mêze bikira, mirovê bigota qay xavikeke reşe gircîgircî daye  
serê xwe.

Gava ko çavên dîwaneyî bi Werdekê ket. Li serê rêya Werdekê  
rawesta û

dengê zikirxana xwe bilindtir kir. Dema ko Werdekê dîwane dît,  
serê

mahîna Barxane berev kir û dizgîna wê hilkişand. Li ber serê bergîrê  
dîwane rawesta. Destê xwe li ber piştê xwe gerand, xwest ko  
keşkûla

dîwane bidê û pê ra jî gote dîwane:

- Dîwanê xoşdevî ji te ra oxir be!
- Oxira xêrê be Werdeka pehlewan!
- Dîwanê hêja tu yê weha bi oxir kû da herî?
- Werdek dema zozanan e. Ez li nav êlan digirim û keşkûla xwe  
berev

dikim. Ezê her weha li berekê da bikevimê ta Şengarê herim.

Gava ko dîwane got ezê ta Şengarê herim, hizrek weke çirûskekê li  
na-

va serê Werdekê da vêket. Pisrî:

- Heylo ta Şengarê!?
- Erê ez her sal jî her ji Sîpanê Xelatê ra dest pê dikim û ta Şengarê  
diçim.
- Xudê dîwane tu jî xweş digerî. Gelo tu li Şengarê diçî mala zarên



Hesê Dûdêyî jî? Gelo tu wan dinasî?

— A, a, ez her sal diçime mala wan. Kê heye ko her sal li nav êl û hozên

kurdan bigere û nav û dengên kurên Hesê Dûdêyî, nav û dengên her heft

pehlewên navdar nebihîze? Ez her sal diçime mala Êzdîn û birayên wî.

285

BILÎCAN

— Dîwanê delal li her oxirê da çend dibe destvehata te?

— Bi yezdan kem qet ez jî nizanim. He Xudê her çi kiribe pişka me.

Ya

me seyvana cîhanê ye, ne malê dinyayê.

— Baş e dîwanê delal, li her oxirê da bîst zêrekî tu berev dikî?

— Na bi yezdan kem!

— Dîwanê delal, ezê çil zêrî bidim te, bi wî mercî ko tu li çi derî giro nebî û rast herî Şengarê. Nameyek min heye li wê derê bigehîne destê

Êzdînî.

Gava ko dîwane navê çil zêrî bihîst, hindik mabû xwe bezir bikira.

Çil

zêr pareyekî hindik nibû. Keşkûla dîwane ya çar pênc salan jî zêdetir bû.

Dîwane bi dengekî nebawerane got:

— Bilanê! Ser çavan!

Dîwane û Werdek herdu li ser rê derketin û li rex rê Werdek li mahîna

Barxane peya bû û dizgîna wê da destê dîwane Dîwane jî hema wisan li ser piştâ bergîrê xwe ye. Vêca Werdekê destê xwe kirê ber şala xwe û kax-et û qelem deranî û ev nameya ji birayên xwe ra nivîsî: Birayê minî xoşdevî Êzdînê delal! Ez li rêka dûr û li welatê xerîb û bêkesiyê da te ji dil û can silav dikim û destên te radimûsim. Eva demanekî pir dirêje, me agah ji hevdu nîne. Ez dizanim hegera wê hindê çî ye. Şerên hozgelî û eşîretiyê, şerên xwe bi xwetiye bûye heger ko li dirêjaya vî demanî da em neşên hevdu bibînin. Heger hûn dixwazin li rewşa min agadar bin, sipas ji yezdani ra, ko ez başim. Her dû xulamên we jî êdî mezin bûne û bûne cotek xortên gihîştî. Rûyê min li bin piyên te be! Vira dilê Kerrî ketiye qîza Emer Axa yê Milî. Emer Axa jî hez dike. Lê qelenê qîza xwe Bilîcana Mîrê Ereban xwestî ye. Eve du sê roj in ko Ker û Kulik ber bi zomeyên we rê ketine. Ez ditirsim ewan bîn, li wê derê û cewantî û nezantiyê bikin. Ez tikayê ji te dikim, bi her cureyî ko dibe, Bilîcanê ji Mîrê Ereban bistîne bide herdu xwarzayên

xwe bila ji Emer Axayî ra bînin. Da kû mirazê wan li nîviya rê da nemîne.

Ez giştî zarên binemalê silav dikim. Destên mezinan û çavên biçûkan radimûsim. Ez bendî arîkarî û bersiva te me.

Xûşka te Werdek

Werdekê destîneya xwe avîte binê namê û name nivîşkî qet kir û ew da

destê dîwane û li dû ra dest avîte ber pişta xwe û kîsikekî çil zêrî li ber piş-

ta xwe derxist û da destê dîwane û gotê:

— Hanê ev jî bexîşa te! Tikaye dîwanê delal şevê bike roj û rojê jî bike

şev û li çî ciyan raneweste. Îsal keşkûlê berev neke. Tu ko li bal mala bi-

286 BILÎCAN

rayê min zivirî ezê dîsan jî pişka te bidime te. Ez dîsan jî daxwazê ji te

dikim, tu bi bextê pîrê xwe bikî, li çî deran gîro nebe û rast here mala Êzdîni.

— Bêy gotin. Tu lap dilniya bibe. Ezê her niha da rê bikevim.

Dîwane û Werdekê xatirê xwe ji hev xwestin. Bergîrê dîwane her weş lê

diket. Gava ko Werdekê li rewşa bergîrê dîwane nihêrî, li dilê xwe da got:

Yezdan kem ev bi wî bergîrî qet salekê jî nikare here beriya Şengarê û

bizivire. Li dû dîwaneyî ra kire gazî:

— Dîwanê delal! Dîwanê delal!

Bi dengê Werdekê ra dîwane wehimî û dizgîna bergîrê xwe hilkişand û

bi nihêranî bersiv da:

— Fermo Werdek!

Dîwane we hizirî ko Werdek ji bexşîşa xwe poşman bûye. Ustuyê xwe

xwar kir û li ser Werdekê da zivirî. Werdekê gotê:

— Dîwane ez dîna xwe didimê hespê te bêkêr e. Were em hespên xwe

lêk biguherin. Ev hespê te yê ta beriy Şengarê te dernexe. Tu li mahîna

Barxane siwar be û ezê jî li hespê te. Lê tu bixwe dizanî mahîna Barxane

maka Sosik û Nijdî ye, haya te baş lê be ha! Eger tu bi xêr û xweşî zivirî,

ezê dîsan jî bexşîşa te bidim.

Dîwane bawer nedikir. We hizirî ko Werdek wiya dixapîne û bi serê wî

dikene. Lê nizanî ko bona kuran agir bi serê wê ketiye. Mahîna Barxane

ko çi tişt nîne, eger dîwane konê çil stunî jî bixwaze Werdek nabêje na.

Hespên xwe lêk guhorîn. Devê dîwane li ber şabûna vekirî mabû.

Werdekê dîsan xatirê xwe ji dîwane Cindiyî xwest û ber bi mala xwe zivirî.

Dîwane xwe li ser piştî mahîna Barxane nedigirt. Hindik mabû

mahîne ew birevanda. Lê dîwane bi zorê xwe li ser pişta wê bi qaşa  
zînê va

girt û dizgîna wê berev kir.

Pêşiya gotine : kurmên şîrî, her ta pîrî. Hindek kar ji bo mirovan  
dibin

xû û xide. Çi hêz û çî şîyan û viyan neşê karên wisan ko kirina wan li  
mejiyê hestikên mirovî da rûniştine, derîne. Eger kesek fêrî  
kiriya rekî bû.

Eger kiriya rek ji kesekî ra bû kiriya rekên rojane, êdî neşê dest ji wî karî  
bik-

işîne. Her çend bixwaze jî, lê li destên wî bixwe da nîne. Hêzek serayî  
hemû hêzan mirovên xûgirtî bi gişt hêza xwe va ber bi kirina wî  
kiriya rekî

pal dide. Xudanê kiriya rekên weha her çend bi giştî hêza leş û heşê  
xwe

dixwaze dest ji wî karî bikişîne, lê li ser nakeve qet, belkû ji bo kirina  
wî

karî ji berê tamarezûtir jî dibe.

287

BILÎCAN

Dîwane Cindî jî li dirêjaya temenê xwe da, fêrî geriyana nava êl û  
zome

û gundan bibû. Sala ko dîwane neketa rêza zome û gundan, nexweş  
diket. Serêşiyê digirt. Dermanê wê serêşiya wî geriyana bû. Bixwe  
her dem

digot: Geriyana dermane, qismet li ser piyane. Gera bi telbik û postê  
pezkûviyan û keşkûlê ji dîwane Cindî ra bibû xû û xideyê her salî.

Dîwane nikarî terka wî xideyê xwe bikira. Nanê deriyan ketibû zikê wî.

Ew fêrî nanê muftê bibû. Fêrî seyran û geriyan û telbiklêdan û beyt û helbestxwendinê bibû.

Gava ko ji Werdekê qetiya, biriyar girt ko çawa Werdekê sipartibûyê,

şevê bike roj û rojê bike şev û xwe zû bi mala Êzdîn pehlewan ra bigehîne

û nameya xûşka wî bigehîne destî. Lê hê du çivaneya rê neçûbû, ko dengê

pezên koçeran li ber guhên wî ket û dilê wî ji bo seyranan nav zomê û

xwendina çend beyt û helbestan lerizî. Dilekî gotê ca here serekî li vê

zomê bide, paşê. Dilekî jî gotê na, Werdekê sipartiy min ko zû herim.

Dilê wî tijî xuşoşe bû. Herim yan na? Na neçim. Ezê herim çi? Lê dîsan

li dilê xwe da got: Hê zû ye, ca bihêle ez serekî jî li vê zomê bidim, paşê.

Mahîna Barxane li bin min da ye. Ezê herdu heftiyan da xwe bi beriya

Şengarê ra bigehînim. Dîwane serê mahîna Barxane li ser zomê da zivi-

rand. Li biniya malan peya bû. Dizgîna mahîna Barxane ra girt û helbesteke evîndariyê bi miqamekî şad xwend û pê ra dest pê kir li telbikê

da. Piştî helbestê xelkê zomê li dorê berev bûn. Her kesî jê ra tişteki di-

hanî. Çend kesan jî mahîna Baxane nas kirin:

— Dîwane te ev mahîna ji kêderê haniye?

— Pîrê min gîhand.

Dîwane li wê zomê ber bi zomeyêke dî. Li zoma dî ber bi yeke dî çû û

kete rêza zomeyan. Da kû li zomeyêkê da bikirrek ji mahîna Barxane ra

peyda bû.

Erê kurro ez û mahîna Barxane? Hemû vê mihînê nas dikin, yê bêjin ka

min diziye, çawa! He ya baş ew e ko ji xwe ra bifiroşim. Werdekê he bixwe jî gotiye min eger te nama min gîhande destê birayê min û tu zivir-

rî ezê pêşkêş û bexşîşek dî jî bideme te. Ezê he herrim û nama wê jî bidim

birayê wê. Îca Werdekê çi li min bike. Dîwane bi van hizran mahîna ko

her piyekî wê bi sed zêrran bû, bi deh zêrran û bergîrekî ra guherrî.

Suwarê bergîrê xwe bû û weke hersal kete rêza zomeyan û li evîna ger-

riyan û keşkûlberevkinê da, nama Werdekê û bisparteya wê jî lap ji bîr

kir.

288 BILÎCAN

Ev demanê çend rojan e ko koça kurên Werdekê li rê ketiye. Hindî  
berjêr  
diçin, hind diçe, rê û dirb, çil û çiya ji wan ra nenasiyar tên. Daketine  
besteke nenas.  
Koç li rê ketiye. Karwanî li rê da nin. Lawên Werdekê ber bi beriyê  
rê  
ketine, lê ev çendik û çend roj in hê çiyayên ser bilind kuta nekirine.  
Çiyayekî li pişt serên xwe ra dihêlin, çiyayekî dî li ber wan derdikeve.  
Geliyekî kuta dikin, geliyekî li wî kûrtir li ber wan devê xwe vedike.  
Gelek caran digîjin serê duriyanan nizanin yê li kî alî da herin. Li serê  
duriyanan dimînin, radiwestin, bêhna xwe distînin. Pêroyên xwe  
diçêrînin û hîviyê dimînin, ta ko rêviyek, rêbiwarek, karwaniyek, şî-  
vanek, gavanek li wan derkeve û ji wan ra salixê rê û dirban bide.  
Waye li binê geliyekî da, li dilê newalekî da berjêr dibin. Ev çend şev  
û  
çend roj in, yekbîn rê hatine. Lê hewayaya şeva dî pir sar bû. Ewan li  
ser  
çiyayekî pir bilind ra daketibûn binê newalekê û li binê newalê jî ber  
bi  
rastiyekê dişûlikîn. Rê li pêşberî wan da dibû du çiqan. Çiqek ber bi  
milê  
aliyê rastê diçû, ya dî ber bi milê çepê. Rêya milê rastê dikete  
berwareke  
xîştor û ber bi çiyayekî bilind, ko li raser geliyekî kûr da kolozê xwe  
xwar  
kiribû, diçû. Lê riya dinê li rex çîmen û dehleke mezin ra derbas dibû  
û



ber bi binê deştekê diçû. Ev riya ko ber bi deştê diçû, rêyeka pan û  
berîn

bû. Mirovî ko weha li rê dinihêrî, mirovî digot qay marekî gew r e  
ko li

nav mêrg û çîmenan da pêş da dişûlike. Marekî gewir li nav  
şînikatiyeke

xizik da. Vî alî, wî alî rêkê da dehl û mêrg û çîmenên rixtim û lev  
aliyayî

bûn. Giyareşê davîte ser serê mirovan. Eger mirovekî kinik û kudûz  
weke

Neimeti xwe li wan dehl û çîmenan bida, yê li nav da wenda biba.

Taze tavê ziliqandiye deştê. Li ber tavê rewneq dikeve xunava li ser  
gul

û giya û mêrg û çîmenan. Her libeka xunavê wekî hêsireke gir, li ser  
rûmetê sêviyekî, wekî libeke xûyê li ser tefeşa dildarekê, li ser  
pelgên gi-

yareşe û gulbergên gulan diteyîsin. Li ber xunavê mirovî nikarî xwe  
li çî-

men û mêrgan bida. Eger yekî nezan û nedîtî sibêdeyeke wa, bide  
serê wî

ko ji xwe ra li nava wan mêrg û çîmenane da pêgermokê lêde, dê ta

289

BILÎCAN

navtengê bibe av û şêlav. Dê wisan ter bibe, mirovê we bihizire ko  
ewî

xwe bi şalî va li avê daye.

Karwanê kurên Werdekê xwe dane serê duriyanê. Nizanîn yê kî alî  
da  
herin. Kerr gazî Hasûxani kir û gotê:  
Hema baran li ser wê duriyanê danê.  
Hasûxan serê qentera hêştiran zivirand. Qenter lev aliya Neimetê Îs  
û  
Êxoyê file jî çûne alî wan. Alî hevdu qentera hêştiran yêx kirin. Bû  
oreo-  
ra hêştiran. Kef li ser devê wan ketibû. Hevalan alî hevdu kirin û  
barê gi-  
ran li ser piştta pêroyan hilanîn. Hesp û hêstir qeyd kirin û hêstir jî bi  
hev  
va girêdan û berdane devê rê. Hesp û hêstirên birsî, giyareşa devê  
rê  
didirîtin. Lê hêştiran bêy hemdê xwe giyareşe dixwarin.  
Li pêşberî çîmen, fêza rêka ko ber bi çiyayê bi xîştor û zozanan diçû,  
lêmiştgeheke xîzelan berva diçû. Lêmiştê xîza hûr li ser hev da  
hîrşandibû. Li nav wê lêmiştgehê da, kerbeş û kengir û qelemên  
hêştiran  
qulqulî hêşîn bibûn. Li nav qetên wan da jî hewşan li hev aliyabûn.  
Hasûxan gava ko dîna xwe dayê, hêstir bêy hemdê xwe giyareşê  
dixon,  
qentera hêştiran ber bi wê lêmiştgehê kişand. Dema ko çavên  
hêştiran li  
qolên kengir û qeleman ketin, wek Ecemên ko çav bi penîrê ter  
bikevin,  
hêriş birin ser wan. Her yek kete ser bêhna qoleke qîvarê da. Qolên  
hin-

dek qîvaran ji gezekî jî zêdetir bilind bibûn. Hêştiran devê xwe li binê  
qî-  
varan da cî dikirin û qîvar ta serî loç dikirin û qîvar weke şivikekê rût  
di-  
hêlan. Şivên qîvaran bînanî mirovên rût û tazî, mirovên ko kincên  
wan  
bi destê zorê lê hatibin şiqitandinê, dihejikîn. Vêca şîreyeke sipîçîl,  
bînanî  
şîrê bizinan seranserî wan şivikên rût didane ber xwe. Leşên şivikan  
sipîçîl  
dikir. Te digot qay her şivikekê satilek şîr li ser da rijandine. Paşî  
demekê  
ew şîrê sipî li ser şivikan dimeyî. Rengê wî berebere kesk dibû. Paşê  
şîr lap  
dimeyî û hişk dibû. Îca rengê wan şivikên rût ber bi qaweyî bûnê  
diçûn.  
He di gavekê da hêştiran wisan ew qîvarana rût kirin, seranserî  
besta qî-  
varan bû besteke şivikên rût. Te digot qay ta wê rojê çî pelg û stirîn  
bi wan  
qîvarana va nehatine.  
Hêstirek barbir bi qeyda xwe va li koma hesp û hêstiran qetiya û  
kete  
nava dehlê. Her çend ko herdu destên hêstirê qeyd kirî bûn, lê  
hêstir  
radibû li ser herdu piyên xwe û herdu destên xwe radikire hewa û  
pêş da

banz dida. Careke dî dîsan gaveke dî pêş da davît. Neimetê Îs li dû hêstirê

ket. Hêstirê bi dengê wî ra lap lezand û ber bi nîveka dehlê helat.

Neimet

li nav giyareşên dehlê da wenda bû. Mirovî dikarî tenê serê wî bidîta, ko

bînanî kûselekê, li nava giyareşan da vî alî, wî alî difirikî. Neimeti bi kul

290 BILÎCAN

û halekî hêstir li nava dehlê deranî û ber bi hespan zivirand. Ta ko Neimet li nav dehlê derket, ta ser girkê milên wî jî ter bibû. Şelpetelpa wî

bû. Çarixên wî tijî av bibûn. Te digot qay ewî her bi cilikan va xwe li avê

daye. Nikarî li ber giraniya şal û şapikan piyên xwe biavîta. Hemû bi Neimeti kenyan. Her yekê tişteke digotinê. Neimeti piştta xwe da wana û

çarixên xwe ji lingên xwe şiqitand. Gorên xwe jî ji piyên xwe derxist û gi-

vaşt û avîte ser qîvarekê.

Elik, Loko, Evdurahmanê Terikî, Êxoyê File û Hasûxan ketin wan bestana qirş û qal û paserî û devendeştî berev kirin. Ta ko Neimeti cilkên

xwe li ava xunavê dakuta, ewan agirek hil kirin û xwe dane ber jî. Hemû

li rex agiri rûniştin. Evdurehmanê Terikî nan û pêxwarin li têrxurcan de-

ranî û li ser hebanan raxist û pêkve xerîkî xwarinê bûn û zikên xwe  
li nan  
û pêxwarinê heşandin. Neimeti jî letek nan dabû destên xwe û  
dikişande  
ber qîlên xwe û li ber agiri rawesta bû û leşê xwe yî kinik hişk dikir.  
Hulmeke sivik û ronî ji kincên wî quloz dibû. Berebere rengê şal û  
şapikên wî hatin guhorînê û kincên wî hişik bûn. Li dû ra Neimeti  
gora  
xwe jî da ber agiri û hişik kir. Ev gora wî, goreyeke neqîş bû. Çavikên  
ren-  
gareng li ser pozika gora wî dihatin xûyanê. Eva gora jina wî ya biçûk  
hê  
dema ko destgirtî bû, jê ra çêkiribû. Gava ko çavên Neimeti li  
çavikên  
gorê ketin, kete bîra cotên jinan û li dû ra hizra cotek jinên dî jî li  
nav  
mejiyên wî da lev geriyan. Neimet ko wisan diponijî, Êxoyê File gote  
Kerrî:  
— A, waye siwarek li wê riya ko em tê ra hatine ber me tê. Kerrî  
dûr-  
bîn da ber çavên xwe û li binê newalê nihêrî û keniy û got:  
— Kuro dîwane Cindiye. Ev malavaya mirov her ko da diçe, li  
wêderêye ha. He karê wî geriyan û keşkûlberevkirine.  
Li vê gotinê da bûn, ko Siwar hat û li rex wan ra derbas bû û destê  
xwe  
bi wateya silavê ji wan ra bilind kir.  
Xelkê hemûyê dîwane Cindî nas dikirin. Lê dîwane Cindî rojê li

zozanekê û şevê li gundekî bû. Ew hind digel mirovên cur be cur rû  
be rû

dibû û rojê diçû ciyekê, hind komel bi nav nedinasî. Kerr û hevalan  
sila-

va wî vegirtin. Kerrî li dû ra gazî kirê.

Dîwanê delal tu weha bi lez kû da diçî?

Dîwane bi hejiyareya destê xwe pişta çiya nîşanî wan da û got:

— Ta zozanên çiyayên Qilîç.

— Here ji te ra oxir be.

Dîwane berê xwe da berwara xîştora û hespê wî li nav xîştora ra bi  
zorê

291

BILÎCAN

hilkişiya. Hê dîwane li pêşîra girê xîştora da nequlubîbû ko Kerrî  
ferman

da hevalan:

— Hevlno rabin bar kin! Dereng e.

Heval hemû bi hev ra rabûn. Hêştir û hêstir înan û her yekê hêştirek  
bar kir. Li dû ra her kesî teng û berên hespên xwe şidandin û tev lê  
siwar

bûn û li rê ketin û dane dû reşê dîwane Cindî. Li pêşîra girê xîştora ra  
hilk-

işiyar. Hesp û hêstirên nalkirî bi sanahî li pêşîra giriki ra hildikişiyar.  
Nalên wan dikete ser kevira û qirçeqirç li kevira dihat. Kevir li bin  
piyên wan da hûr dibûn. Dengê hûrbûna kevira û qîrçîna nalên  
wan

tevî hev dibûn. Lê hêştir nikarîn baş li nav wan xîstorana da hilkişiyana.

Ajelên bê zar û ziman te digot qay lingên xwe didine ser şûjin û derziyan.

Xîstorên tûj li piyên wan ra diçûn û piyên wan birîndar dikirin. Bi kul û

halan li ser girê xîstori ketin. Wî alî girikî newaleke dûr û dirêj ber bi dilên

çiyên hevraz hildikişiya. Newal wisan teng û dûr û dirêj û qivrax bû, te

digot qay dilê çiyên bi kêrikekê durust li nîvekê da kirine du letan. Aveke

zirav û zelal li nîveka wê newalê da berjêr dişûlikî û li piştî giriki da ber bi

deştî mêng û çîmenan difitilî.

Giheştin ser wê avê. Li rex avê hemû li hespên xwe peya bûn û hema wisan li rex avê xwe deverû dirêj kirin û qurûyî avê bûn. Li dû ra her kesî

gema hespê xwe li serî şiqitandin û hespên xwe av dan. Li dû avdana pêroyan ra li avê derbas bûn û milê rê ra girtin û hevraz hilkişiyên û dane

berwarekê. Li berwarê ra rê hêdî hêdî nerm dibû. Hêdî hêdî li hejmar

kevir û kuçik û xîstoran kêr û kêmtir dibû. Hindî li berwarê ra dikudandin, hind diçû dîmena erdê dihate guhorînê. Erdê hişk û berdolan

berebere dewsa xwe dida erdekî pêrge û nerm. Piştî çend demjimêran

berê wan kete nizarekî vekirî. Li her alî kerî û kertepez bûn ko li  
pêşîra  
nizari da bijiqî bûn. Her keriyekî çendîn seyên gurêx li ber bûn.  
Hokehoka şivanan bû. Gava ko seqan çav bi karwanî ketin, hucûmî  
wan  
kirin. Seyên keriyên li karwanê kurên Werdekê reyîn. Şivanan xwe  
dane  
ber san, da ko karwan derbas bû. Karwan berebere li ser bilindaya  
berwarê ket. Gava ko li ser bilindaya berwarê ketin, gehîştin  
textanekê.  
Besteke rip û rast li pêşîra çiyayekî bilind da ber va diçû. Li milê rastê  
yê  
textanê da kon û xîvetan mil kutabûn hev. Şiverêyek li nîveka kon û  
xîve-  
tan ra derbas dibû û ber bi binê textanê diçû. Karwan bi hemdê xwe,  
hêdî  
û hemet, bi giranî û êminî li nav konan ra derbas bû. Zarên zomê bi  
dîti-  
na karwanî ra derdiketin ber derê kon û xîvetan û li karwanî mêze  
dikirin  
û dîsan direvîn û diketin hundurê kon û xîvetan da. Qîz û bûkan  
serên  
292 BILÎCAN

xwe li ber qetên kon û xîvetan ra derdixistin û dizî va çavên xwe li  
bejin û  
bala karwaniyan digerandin û li dora xwe mêze dikirin û dîsan serê  
xwe



dibirin jor û xwe li pişta çît û perdan da vedişartin. Lê çî mêr li nava zomeyan da nedihatin xûyanê. Kuliki li ber lêva xwe da got:

Lê ka mêrên vê zomê? Û paşê ji Kerrî pirsî:

— Kerr tu dibêjî qay mêr li van zomeyan da tunenin. Lê ka mêrên vê zomê?

— Bi me çî ? Ewan jî ka Xudê bizanibe niha li dû çî ketine.

Kulik êdî nekete peyê pirs û pirsiyaran. Karwan li nav kon û xîvetan ra

derbas bû û giştî zomeyên wê textanê li pişt serê xwe ra hêlan û hema

wisan li milê wê şiverê yê ra girtin û pêş da çûn.

Nêzîkiya rojava bû ko Kerrî gote hevalan:

»Hûn hêdî hêdî werin, ta ko ez pêş da diçim û êwirgehekê peyda dikim.

Waye sî dageriya û êvar pê ra giheşt. Eva çend şeverojin ko me baş bêhna

xwe nestandiye. Pişta wan ajelana jî li ber baran kul bûn. Guneh in dê

cedew bin û li ber baran bikevin.«

Kerrî ev got û zengî li Sosikê da û li ber çavên hevalan dûr ket.

Kerrî bi bayê bezê hajot û di qasekê da ew textana pan û berîn kuta kir

û li ser textanê da jor da dakete serberjêrekî ne hind kûr da. Berjêrekî

beroj bû. Erdê wira jî tijî kevir û kuçik bûn, lê kevirên wê xîştor nebûn.

Li pêşberî wî berjêrî da sîlvaneyeke mezin û vekirî ber va diçû.  
Lêmiştê  
kevirên hindî leşên kelan li pêşîra çiyar da jor da hanîbû û belawî  
nava  
bestê kiribû. Lê diyar bû ko ew sîlvaneya, sîlvaneyeke taze nîne.  
Lêmiştgeheke kevin e. Ya çend salan berî niha ye. Seranserî wê  
lêmiştge-  
hê li kerengên cur be cur û qelemên hêştiran da hatibû  
vepoşandinê.  
Qolên qîvar û kerengzer û qelemên hêştiran bînanî leşkerekî siware  
mil  
kutabûn hevdu û ber bi bilindayên lêmiştgehê pêş da diçûn. Xûlekî  
gi-  
rane hêştiran jî li nava wan qîvar û kereng û qelemana da dilewerîn.  
Xûlê  
hêştiran bijiqîbûn nava wê qîvargeha berfire da. Her hêştirek li  
goşeyekê  
da xerîkî lewerînê bûn. Oreora wan bû. Orîna wan li wê qîvargehê  
da  
deng vedida. Kerrî lap nêzîkatî bi xûlê hêştiran kir û li nav xûlê girane  
hêştiran ra derbas bû.  
Ta wê rojê Kerr ew hinde hêştir li ciyekê da nedîtibû. Te digot qay li  
rex  
her qoleke qîvarê da hêştirek rawesta ye. Qet çî hêştirvan jî li ber  
çavan  
nediket. Kerr bi bez li nav xûlê hêştiran ra derbas bû. Hêştir bi beza  
Sosikê silikîn û dane dû hev û ber bi zomeyan rê ketin. Sî  
dageriyabû.

Siya Kerrî li ser pişta Sosikê neh deh gezan dirêjtir bibû. Siya wî berî  
wî

293

BILÎCAN

daketibû serê rê û pêş da diçû. Xûlê hêştiran jî yekoyeko û  
gultegulte di-

hatin û li wî derbas dibûn. Kerrî li ber xwe da got:

— He rast gotine, hêştir çendê dûrî hev biçêrin jî, lê serguhên wan  
li ser

hev in. Tu dîna xwe nadê her gava yekê ez dîtîm, yê dî hemû pê  
hesiyan

û wan bi dîtina min ra ber bi malan dikişin.

Sî lap dageriya. Li fêza rê da çavên Kerrî bi kefekî ket ko weke  
guherekê

bû. Kaniyeke biçûk jî li naverasta wê guherê da dihate xûyanê. Kerrî  
ber

bi wê guherê hajot. Dorandorî kaniyê selbend kiribûn. Aveke qasî  
lûlikê

lûlehengekî li ber kaniyê dikişiya. Li fêza kaniyê jî kewne çarberek  
dihate

xûyanê, ko xweliya wê li nava şînikatiyê ra li ber çavan diket. Bi  
dîtina

kanî û çarberiyê ra Kerrî zanî ko ev dera guhera peziye. Gava ko Kerr  
gi-

hîşte rex kaniyê, li dor û berên kaniyê nihêrî û li ber xwe da got:  
Êvirge-

heke baş e. Emê hema îşev li vira biêwirin. Li vê hizrê da bû ko  
meyayeke  
çîle çavreş li ber wî ra derbas bû. Mirovî dil nedikir li meyayê  
binihêre.  
Kudikeke li wê ciwantir jî dabû dû. Kudikê gerdena xwe ya dirêj û  
şimşad  
xwar kiribû û yek alî dîna xwe dida Kerr û Sosikê. Ê tirsetirs li ber  
wan ra  
derbas bû. Kudik hind sipî û cuwan bû, mirovî digot qay telteyek  
berfa  
zozana ye. Çavên wê te digot bi dest kil dane. Weke zarokekê li dû  
maka  
xwe ketibû û oreora wê bû. He gava ko çavên Kerrî li kudikê ket,  
şîretên  
Werdekê ketin bîra wî. Kerrî li dilê xwe da got: He Xudê Werdekê  
rast  
digot. Kî vê kudikê bikuje, Xudê wî nagehîne çi miraz û mebestan.  
Kuro  
destê kîjan xûnmij û xûnxorî diçe vê firîştê û ser jê dike. Destê kî  
diçê van  
herdu firîştana ji hev biqetîne. Destê kîjan dilkevîrî diçe vê firîştê bê-  
guneh ser jê bike. Yezdan kem pir gunehkî giran e ko mirov destên  
van  
herdu firîştana ji hevdu biqetîne. Ay Xudê çende cuwane! Çavên  
Kerrî  
her li kudikê bû. Kudik wisan qelew û tijî û pir bû ko te digot qay bi  
dest

dagirtine. Kûfana wê li ser piştê da tewiya bû. Gava ko direvî kûfana wê  
weke hêlikanekê dihejikî. Hêtên kudikê qelew û dagirtî bûn. Gava ko  
çavên Kerrî bi hêtên wê û bi kûfana li ser pişta wê ket, li gavekî da bêhna  
kebaban, bêhna goştê taze da qafê Kerrî. Bû çizeçiza patîlokan li se agiri.  
Bêhna kebaban hiş û hedamên Kerrî li serî derxistin. Her tişt li ber çavên  
Kerrî hatin guhestinê. Eva çendik û çend roj in ko wisan yekbîn rê dikudînin. Mêjveye ko goştê taze, ew jî kebabên yeksaliyan nexwariye.  
Kebabên bêçan, patîlokên berx û kar û golikan, qelîsêlên yeksaliyan ji her  
qelîsêl û kebabê bi mirçtir û xweştir e. Zû dipije û xudanê mirçeke tay-  
betiye. Erê qelîsêla yeksaliyan pir xoşe. Bi van hizran çavên Kerrî bi kuçikên şivanan ket. Kuçikê hilkirî û qelîsêla li ser danayî hatte ber çavên

294 BILÎCAN

wî. Bêy hemdê xwe dest avît terkiya Sosikê û kemenda xwe li terkiya wê  
vekir û hajote ser hêştira çîle çavreş. Hêştir li Sosikê silikî û xwe avîte na-  
va qîvaran. Kerrî da dû wê. Du sê caran kemend avîte skura kudikê.  
Lê

kudik sil bû û li dora maka xwe ra kete çerxê. Kerr da dû wê. Her duk li dora meyaya çîle çavraş ra hatin û çûn. Kerrî kudik ji makê qetand. Kudikê xwe avîte nava qîvaran. Li dora qoleke qîvar ra bû turik. Bû ore- or û zarezara kudikê û makê. Kerrî Sosik li qîvaran da. Bû şîheşîha Sosikê. Kerr kemenda xwe li dor serê xwe ba kir û avîte skura kudikê. Kemend li skura wê aliya. Kerrî ew li dû xwe ber bi kaniya guherê kaş kir. Maka kudikê kef li ser devi ketî, hêriş anî ser Kerrî. Kerrî du sê caran rima xwe dirêjî maka wê kir. Meya li rima Kerrî tirsîya û li dora wan ra bû turik. Kerrî her wisan siwarî kemend li dora kudikê aland û zengî li Sosikê da û kemend li lingên kudikê şidiya. Li dû ra Kerr li Sosikê peya bû û kemend li nav lingên kudikê ra derbas kir û kişan û ew li erdê da û pê kemendê baş her çar lingên kudikê girê da. Kudikê dikire oreor û xwe li erdê diçirçirand. Kerrî destê xwe avîte xencerê, li ber pişta xwe deranî û hindî tawa milê wî hebû, xencer li kevçika dilê kudikê da daçikand. Bû zarîna kudikê û fîşqîna xûne li ber xencerê ra avîte hewa. Destê Kerrî ta anîşkê li xûna kudikê da sor bû. Zarezara kudikê bû. Te digot qay zarikeke şîr-

mij e û li ber êş û azarê digirî û gazî dayîka xwe dike. Maka wê jî li dora wê û Kerrî ra çerx lê dida û dikire oreor. Te digot qay maka kudikê lavayiyan li Kerrî dike û li ber Kerrî digere û lê dipare û dibêjê, tu û oxira xwe tu kudika min ser jê neke. Tu û oxira xwe tu destê min û kudika min ji hev neqetîne. Lê êdî xûnê berê çavên Kerrî girtiye. Bi zarezara makê û kudikê ra li ber xwe da got: Xudê xûna wan helal kiriye, ez çi bikim. Lê maka kudikê terka wan nedikir. Kerr li Sosikê siwar bû û rima xwe da destê xwe û maka wê raqetand. Maka kudikê bi neçarî û bi zarezar çû gi-hîşte xûlê hêştiran. Kerr zivirî ser cendekê kudikê. Xûnê hiriya kudikê ya sipîçîl sor û gevez kiribû. Hê jî fîşe fîşa xûnê bû li ber xencerê ra hildavît. Hê jî kudikê dest û piyên xwe dadikuta. Hê jî zarezara wê bû. Lê berebere dengê wê hêdî û zelûl û melûl bû. Xûn jî êdî hêdî hêdî diçikiya. Kudikê jî hal diket. Kerrî dest avîtê û bizerê xencer li pêşîr wê kişande derva. Bi kişandina xencerê ra, kudikê veciniqî û bi tundî xwe çirçirand. Kerrî êdî kelên nedayê û xencera xwe ya xûnavî danî ser skura wê û gerdena wê ya

zirav birî û serê wê ji cendekan cuda kir. Xûneke hindik ji rehên skura

kudikê kişiya. Bû fîşefîşa bêhnê li qirqirîşka wê ra avîte derva. Êdî serê

kudikê li ser leşê wê nibû. Lê hê jî kudikê dest û piyên xwe li hev didan.

295

BILÎCAN

Kerrî serê kudikê yê jê kirî danî rex kaniyê. Çavên kudikê zelal bibûn.

Ça-

van bi Kerrî ra xeber didan: Te çima ez kuştim? Min çi li te kiribû ko te

destê min û maka min ji hev qetand? Te bo çi serê min jê kir? Guneh û

sûcên min çi bûn? Mirovî dikarî hezar û yek gilî û gazinde û pirsiyaran li

çavên kudikê da bixûne. Kerrî xencera xwe hilanî û li biniya kaniyê rûnişt

û xerîkî şoştina destên xwe û xencera xwe ya xûnavî bû.

Tarî ketibû erdê, ko koçê xwe pê ra gîhand. Bi giheştina koçê ra Sosikê

guçkên xwe mûç kir û şîhiya. Bû hîrîna Nijdî û oreora hêştiran û ber bi

kaniyê hatin. Kerrî gazî wan kir:

Lê hûn çima wisan gîro bûn?

Kuliki bersiv da:

— Ka em gîro bûne, em jî her li dû te ra dihatin.



Hevalan alî hev kirin û hêştir bi baran va li ser dîwarê kaniyê yêx kirin.

Gava ko hêştir yêx dikirin, çavên Kuliki bi laşê kudikê, ko li rex kaniyê bibû meşk, ket:

— Way lê mala te kivil nebûyî, Kero! Ev çî ye? Te baş şîretên Werdekê

kirin guçkên xwe da. Ne Werdekê em şîret kirin û got kudikan ser jê nekin. Niha te bêy gotin Sosik jî avîtiye nava qîvaran. Hê her tişt gorê û

dojehê da, lê xudanê vê kudikê niha bê, emê çî bersiva wî bidin?

— Kuro de tu jî her li ber xeberên jinikan dikevî, ma emê devê xwe girê

bidin. Xudê xûna wê helal kiriye. Eger xudanê wê jî hat, emê wî razî bikin. De zû karê qelîsêlekê bikin lo!

Hevalan barê hêştir û hêstiran danîn. Lingên hesp û hêstiran qeyd kirin. Çokên hêstiran girêdan. Barên hêştir û hêstiran danîne ser hev û bi

ken û laqirdî hatin û raserî cendekê kudikê ra rawestan. Cendekê kudikê

bibû zend. Elik û Loku dane xencerên xwe û li ser bêhna kudikê da peya

bûn û dest bi gurana kudikê kirin. Êxoyê File û Neimetê Îsi, Hasûxan û

Pasûxan jî alî hevdu kirin û kon û xîvet li ser dîwarê kaniyê vegirtin û li

dû ra daketin wan bestana qirş û qal û devendeştî berev kirin.

Evdurehmanê Terikî jî sêla nanî bire ser kaniyê û sêl pak şoşt û deverû

vergerande rex kuçikê. Li dû ra tawik û tasik û teştik li nava barxanê der-

anî û danî rex kuçiki û çû tayek ard li nav baran kaş kir û anî li rex kuçikê

û devê tayê ardî vekir.

Kulik jî waye sil bûye û bînfişkan vedide û dibêje :

— Şîretên Werdekê kire guharên guçkên xwe.

Evdurehmanê Terikî berê xwe li ser Kuliki da kir û gotê:

— De malavayo te xêre?! Tu qetil nekiriye. Mêr nekuştiye. Heywana

296 BILÎCAN

helalgoşt e. Xudê xûna wê halal kiriye. Tu çima pê nerehet dibî.

Were alî

min em karê qelîsêl û rêtik û bişî û murtoxeyê bikin. Eger xudanê

wê jî

hat, Kerr waye dibêje, emê du beranberî buhayê wê bidine xudanî.

Emê

bêjin kete nav dest û piyên hespan û hespan lê da, em neçar man

me ser

jê kir. Ma vir bi kaviran e? Were alî min! were!

Kerr pê keniya û got:

— De rast dibêjeş here alî, te em bizdandin lo!

Kulik ber bi Evdurehmanê Terikî çû.

Hê cendekê kudikê li nava posti da bû ko hevalan bermil bermil qirş

û

qal û kotik û qurm û devendeştî anîn û li ber kuçikê şivanan li ser

hev da

qûç kirin. Êxo û Neimet alî hev agirek dadan.

Evdurehmanê Terikî jî devê tayê ardî vekir. Teşt li ardî berxweş kir  
û  
danî rex kaniyê. Li dû ra çend tas av berda nav ardi û milên xwe ta  
anîşkê  
veda û arşêlkek çê kir. Arşêlk li nava teştê da lev gerand û hevraz û  
berjêr  
miz da û hevîrekî ronî roqav çê kir û teştik wêda da û bi sifrikek çerm  
ew  
nixabt. Vêca sêla şoştî ra kir û danî ser kuçikê. Elik û Loku jî dil û  
hinav  
û navgelên kudikê deranîbûn û dişoştin. Evdurehman jî çû alî wan û  
dil  
û hinav û navgel tev şoştin û anîn û avîtin nav sêla sor bûyî. Bû  
çizeçiza  
dil û hinav û navgelan. Ta ko dil û hinav sor bûn, Elik û Loku cendekê  
kudikê geh gehî kirin jî û avek li ser da rijandin û kirin beroşekê û  
hanîn  
danîn rex kuçikî. Evdurehman jî dil û hinavên sor bûyî li nav sêlê  
deranî  
û berda nava tawikekê. Qijîn li binê tawikê ket. Li dû ra goştê kudikê  
ber-  
da nav sêlê û sêl danî ser agirî. Vêca ew dil û hinavên sorkirî li  
hevalan  
parve kir. Bû mirçemirça devên wan. Evdurehman devê xwe  
mirçand û  
got:  
— Beh beh! Destkuja Kerrî çend xweş e.  
Kuliki gotê:

— De bixwe bila jehriya marê serkesk be!

Evdurehmanî gotê:

— Ne tu jî waye dixoy!

Êxoyê File bi tirane gote Evdurehmanî:

— Na, na destkuja Kerrî nîne, destpêja te ye wisan xweş e.

Ji bilî Kerrî hemû kenîyan. Kerr li cî yê xwe da timijî bû. Lê hegera nerehetiya xwe nizanî. Gelo li ber gotinên Kuliki timijî bû, yan li ber ser-

jêkirina kudikê bû? Bixwe jî nizanî. Lê tiştê li nava dilê wî da ew nere-

het fikir. Hesp û hêstiran jî serên xwe dabûne ber saxiriyên hev û vizik û

pêşû li hevdu diqewirandin. Carinan jî dikirin firefir û difinên xwe paqij

297

BILÎCAN

dikirin. Sosikê car û baran lingên xwe bi tundî li erdê dida û car û baran

jî lingê xwe li binzikê xwe disût. Hêştir jî yêx bibûn û vedikayîn.

Neimetê Îsi jî xwe dabû ber kuçikê û agir gur fikir. Te digot qay hema li cîhanê da, Xudê ew ji bo agir gurkirinê afirandiye. Bînanî keybaniyeke

çil salî xwe dabû ber agirê û bi ser û ber qirş û qal dida bin sêlê. Êxo bi tan

û niç gotê :

— Tu baş fêrî agir gurkirinê bûyî ha!

Neimet soromoro bû. Qet keyfa wî bi wê yariya Êxoyi ra nehat.  
Xwest

ko xwe li ser va nebe, lê bi xwe nikarî û gote Êxoyi:

— Tu dizanî, tu were gur bike. Zikê te çima diêşe.

Vêca Êxo li dû gotina wî ra pê kenîya û hate bal wî û ewî jî çend  
deven

û qurmik li binê sêlê da ediland. Li dû ra bû mize miza wî û stiranek  
got:

Agiro hey agiro xweş agirê min.

Roja sir û seqemê bav û birê min.

Agiro tu agirê zerdeştê pîr î.

Roja sir û seqemê tu destegîr î.

Agirê geş tu yî germa û rona yî.

Roja sir û seqemê bav û bira yî.

Evdurehmanî bi çaçika darîn goşt li nava sêlê da vî alî wî alî  
verdigerand.

Dengê qijeqija goştî li ser dengê stirana Êxoyi ket. hemû li dora agirî  
kom

bibûn. Li ber ronahiya agirê rengê hemûyan hatibû guherînê. Rengê  
hemûyan sorî va dihingaft. Bi hejiyana alavên agir ra tefeşên wan  
reş û

ron dibûn. Sor dibûn. Piştî demeke xurt qelî li nava sêlê da weke  
xurmayi

sor bû. Evdurehmanê Terikî pîneyek da ber destê xwe û sêla qeliyê  
li ser

kuçikê hilanî. Li dû ra kûfanê kudikê yê hûrkirî, ko li binê beroşê da  
bû,

danî ser agirî û hindek xoyê lê reşand û devê wê girt. Neimetî hindek  
qirş  
û qalên dî danî ser agiri. Evdurehmanê Terikî jî sêla qeliyê danî  
nîveka  
hevalan û got: Dey werin!  
Hevalan milên xwe vedan û ketin ser sêla qeliyê. Jêrçenên hemûyan  
di-  
hejikî. Fişefişa wan bû, goştê kudikê yê kizir dikişandin ber arû û  
pirûyan.  
Hemûyan têr xwarin. Her yek li goşeyekê da veleziyan.  
Evdurehmanî  
bi çocikê kizikê kudikê lev da. Don li binê beroşê da bibû gol.  
Evdurehmanî li dû ra milên xwe veda û dîsan sêl danî ser kuçiki û  
nîvê  
donê beroşê berda nava sêlê û ard lê zêde kir û li hev da. Ard li nava  
donî  
298 BILÎCAN

da li hev geriya. Bû hevîr û hêdî hêdî rengê ardî sor bû. Evdurehmanî  
pê  
çocikê ard lev da û vergerand. Neimet jî hemîn li karê xwe yê  
hemêşeyî  
da bû. Qirş û qal li agirî zêde dikir û agir gur dikir. Ard li nav donî da  
baş  
sor bû. Berebere rengê ardî qimer bû û giştî doni hilçinî xwe.  
Evdurehman dîsan bînanî caran sêl pê pîneyekê girt û wê da pal da.  
Li dû

ra ew mirtoxa li sêlê da berda nava tawikekê û binê sêlê bi çoçikê baş verot

û dîsan sêl danî ser kuçikê. Her çî donê mabû ber da binê sêlê û teşta

hevîrî kişande ber xwe. Êxo jê pirsî:

— Tu yê dîsan çî bikî Evdurehman?!

— Evdurehmanê çî bike? Evdurehmanê ji zikê te ra bixebite. Yê ji hûrê

te ra hindek bişî çê bike. Vêca sifrik li ser teştikê hilanî û teşta hevîrî kişande ber xwe û dest pê kir girikên biçûk, her girikek hindî gîzekê çê kir

û yekoyeko girik avîte nava donî. Qijên li binê sêlê hat. Girikan berebere

xwe li nava donî da dane hav û li ser hev da civiyan û hêdî hêdî don hilçînîne xwe û berebere rengê wan sor bûn. Evdurehmanî pê çoçikê bişî

yekoyeko vergerand. Li qasekê da bişî li nava doni da sor bûn.

Evdurehman bişiyên sorbûyî rijande ser sifrikê. Vê carê sêl paqij kir û de-

verû danî ser kuçikê. Pişta sêlê li hîsê da reş dikir. Evdurehman pîneyek

li ava kaniyê ra kir û ew pînê ter li ser pişta sêlê gerand û ew hîsa li ser piş-

ta sêlê paqîş kir. Hasûxan û Pasûxan her yekê bermilek qirşên dî jî anîn û

her yekê bişiyek ji Evdurehmanî standin û dîsan çûne qirşikan. Li tariyê

da piyên wan li her çi biketa, berev dikirin. Evdurehmanî ew hevîrê ko li

binê teştê da mabû kişande ber xwe. Hevîr li teştê deranî û kire binê beroşa donî û li binê beroşê da baş mizda. Hevîrî her çî donê ko bi binê

beroşê va mabû, hilçinî xwe. Sêl jî li ser agirê baş sor bibû. Evdurehmanî

ew hevîra li binê beroşê da baş pan kir û hema wisan hilda û avîte ser sêlê.

Bêhna don û kiz belayî axaran bû. Hewa jî hêdî hêdî sar dibû. Her yekê

cil û cihazên pêreoya xwe danîn û li ser veleziyan. Evdurehman jî bişî û

nan û kizik û mirtoxe her yek cuda cuda kire hebanan û cî bi cî kir. Kerrî

got :

— Îşev nobedarî gereda Hasûxan û Pasûxane.

Vêca bi vê gotinê ra dakete hundurê xîveta xwe û li dû wî ra hevalên dî

ketin nava konî û hema xwe li ser hev û ber hev ra dirêj kirin. Êxoyê File

jî dîsan mizemiza wî bû stiranek li ber xwe da digot:

Ronî ronî roniyê

Te kiça Ermeniyê

299

BILÎCAN

Can gorî ezbeniyê



De were li ser kaniyê  
Bîne bo min lê canê  
Nav şûşe û îstikanê  
Camek ji şeraba al  
Şeraba wê Rewanê  
Were bal min lê canê  
Li rex gola Sêwanê  
Şêt û şeydayê tem e  
Bo min bîne dermanê  
Bejina Roniya min şûş e  
Dema hildigre şûşe  
Wek agir ber be pûşe  
Dilê min dixûşxûşe  
Lê Ronî keçika File  
Te dilêm kiriye kul e  
Dermanê derdê dil e  
Maçek ji rûyê gul e  
Li dû Êxo ra bû mizemiza Hasûxan û weha got:  
Delalê, lalê lali lalê lali lalê...  
Xaziya hînga malên me danîbûn warê hozan...  
Ez û tu yê em tev siwar dibûn wan şînbozan...  
Meyê dibezande nava mêrg û çîmen, zevî û xozan...  
Li me çi xweş dihat dengê şalûl û bilibil, qaz û qumrî, na Xudê dengê  
kalekala berxan li piştê çît û kozan...  
Wezê sûnd dixom bi tîra rojê, agirê dojê, wezê ji ser te ra nagirim çi  
mi-  
raz û dozan...  
Hê stirana Hasûxani li devi da bû, ko Pasûxan weha bersiva wî da:

Delalê la li lalê delalê la li lalê...

Xaziya hînga malên me danîbûn, li textanê wan baniyan...

Wez û tu yê emê tev siwar dibûn bozên xalxalî na Xudê wan mehnegiyan...

300 BILÎCAN

Me yê dibezande nava gulsosin û beybûn û rihan, na Xudê wan zeviyan...

Li me xweş dihat dengê kewên rube, zarîna quling, na Xudê nalîna berx

û kalîna ewan miyan...

Wezê sûnd dixom bi banê bilind, heft stêran, wezê li ser te ra nahebîn-

im çî zeriyan...

Delalê la li lalê....

Li dû pasûxan ra bû kalîna Kerrî û weha qîrandê:

Delalê lê lê lê li lê lêlê....

Xaziya hînga malên me dinîbûn, delalê dînê li warê nêçîrê, li serê gir û

wê baniyê...

Tu yê bi koma qîz û bûkan va dihatî bindarûkê li ser kaniyê...

Minê ji te ra nêçîr fikir karxezala şîrmij bi wateya qurbaniyê...

Na Xudê minê ji te ra dihanî dil û hinavên xûnavî wek nimûne û nîşaniyê...

Tu evîna ber vî dilî şeva nivê şevê ji min ra dihatî cêjivaniyê...

Wemê ta seyrika sibêdê tev diketin kêf û henek, laqirdî û evaniyê...

Ezê sûnd dixom bi şêx û şemsan, divê ko ez te bikim ji mala giran ra weke serejin û keybaniyê...

Bi dengê Kerrî ra êdî çî deng û seda ji çî kesî nehat. Hêdî hêdî hemû  
xew  
ra çûn. Lê Hasûxan û Pasûxan ta sibêdê bi gered nobedarî kirin.  
Bi berbanga sibêdê ra hewa pir sar bû. Di gel sarbûna hewayê ra  
hemû  
qilqilîn. Kêlekên xwe guhestin. Hasûxan û Pasûxan hatin hundirê  
xîvetê  
û bangî hevalan kirin:  
— Rabin ! Rabin! Derenge!  
Bi dengên wan ra hemû ji xew rabûn. Li nava cil û cuhor û kulavan  
der-  
ketin. Teviziye xwe rast kirin. Sibêdebaşî dane hev. Her yek ber bi  
kor  
û kendalekî çûn. Li dû ra hatin û bi rêz li ser kaniyê serçavên xwe  
şoştin.  
Li dû ra Evdurehmanê Terikî serê yekê letek nan û hindek murtuxe  
danê  
û her yek hema wisan li dora kaniyê rûniştî, xerîkî xwarinê bûn.  
Hestikên  
kudikê li ser kaniyê bibû lod. Kerrî li bin va dîna xwe dida loda  
hestikan.  
Bi lez taştêya xwe xwarin û koça xwe bar kirin û ketin rê. Hê li  
guherê  
derneketibûn, ko boşê hêştiran dîsan weke hemêşe li nav konan  
ber bi qî-  
varistanê dikişyan. Meyaya çîle çavreş vê carê bêy kudik ketibû  
pêşiya

## BILÎCAN

xûlê hêştiran û oreora wê bû.

Karwan li nav xûlê hêştiran ra derbas bûn. Hê xûlê hêştiran kuta nekiribûn, ko dîna xwe danê çil pêncî siwarên tev girêdayî waye keriyekî

pezên çîle qerqaş ko nêzîkî pêncsed pezî dibû, dane pêşiya xwe. Sê term

jî li ser pišta hespan girêdayî bûn. Hespên ko term li ser pišta wan girê-

dayî bûn, li dû xwe ra kiribûn êrdekê. Çek û rextên kuştiyan jî hema wisan bi terkiya hespên wan va girêdayî bûn. Siwar û keriyên pezî hatin

û li wana bihorîn.

Karwanî besta qîvaristanê kuta kirin û berê wan kete newalekî. Newal,

newaleke hind kûr nibû. Lê hindekî serhevraz ketibû. Demeke xurt pê

çû, ta ko li ser ketin. Gava ko li ser hevrazê newalê ketin û giheştin hêsiyê.

Dîmen bi giştî dihate guherînê. Navçeyeke mezin û bi dar û bar bi wan

va hate xûyanê. Hindî çavan kar dikir, gund û bajar û bajêrke bûn ko mil

kutabûn hev û ber va diçûn. Her aliyê wê navçê li dûr va çiyayên bilind

û serkever kiribûn helboqa xwe da. Li hêsiyê da berjêr bûn. Serberjêrekî

tund û zivir bû. Hevalan alî hev kirin, teng û ber û qûş û palûmên  
pêroy-  
an şidandin. Kerr kete pêşiyê û karwanî da dû wî. Li ser berjêri da  
ber bi  
dar û baran şûlikîn. Ta ko ew serberjêra, kuta kirin, roj hate raserî  
serê  
wan. Ketin nava dar û baran. Her alî rêkê darên bîh û çinarên  
destçandî  
dabûne ber xwe. Li gelek ciyan da rê teng dibû. Serên darên herdu  
aliyên  
rê giheştibûn hev. Xoşîna ava cokekê bû li rex rê ra derbas dibû û  
dikete  
nava daristanê. Rê li nîveka gundekî çil pêncî malî ra derbas bû.  
Seyên  
gundi hêriş anîne ser karwanî. Lê du sê kesan xwe dane pêşiya san,  
da ko  
karwan bihorîn. Jinên gund hemûyê reş girtibûn û sûretên xwe di-  
randibûn. Çavên mêran şil û serên wan li ber da bû. Mirovî li reng û  
rûyê  
gundiyan ra dizanî ko qeziyayek li wan qewimiye. Li gund derketin.  
Li  
ber goristana gund ra bihorîn. Goristan li perê gund bû. Gorinên  
kewn  
mil kutabûn hev. Li ser pişka zore gorinan giy lev aliya bû. Pişka zore  
gorinan, gorinên dêriz bûn. Lê tek û tûk jî tê da ber çavan diketin ko  
hat-  
ibûn selbend kirinê. Yan jî bi keviran dîwarek li dorê hilcinîbûn. Du  
gor

jî qubik kirîbûn. Li fêza gorinan çar gorên hindî hev, li rex hev da bera

mirovî li ser xwe da radikişand. Xweliya gorinan taze û ter bû. Bêhna xweliya taze da serê karwaniyan. Evdurehmanê Terikî bi yarî û tirane got:

— Ewanê hanê taze razan e ha.

Êxoyê File li bersiva wî da got:

— Tê jî dê rojekê razê yî, lê xwzî zû xew bi te biketa.

— Bê emeko, ez razêm lê kî ji zikê te yî qedele ra bixebite?

302 BILÎCAN

— Ma tu ji zikê min ra dixebitî?

— Be kê wî hûrî te yî qedele, tu dibêjî sekara kayê ye, bi bişî û mirtux-

eyan diheşîne?

Heval hemû bi van yariyên wan kenian.

Koça kurên Werdekê ketibû nava dar û bar û bax û baxçe û bostan û

parêz û rezan û pêş da diçûn.

Koç li çendîn gund û bajar û bajarkeyên mezin û biçûk bihorîn.

Berebere dîmen û av û hewa dihate guhorînê. Hewa roj bi roj germ û

germtir dibû. Êdî li reng û rûyê erdê û ji çawaniya hewayê ra zanîn ko

bereber digihên germiyanê.

303

BILÎCAN

Kelekela germa havînê ye. Hewa roj bi roj germ û germtir dibe.

Nîvroya

tav li raserî serê mirovî radiweste. Hema bînanî mixekî li nîveka asimani

da kutayî cî da diraweste û nalive. Mixekî zêrînê perperkî bê hej û liv.

Eger bilive jî mirov agah ji hej û liva wê nabe. Li hindek ciyan hulma germ ji erdê û asimanan quloz dibe. Lê li hindek ciyan her ew hulma

jî

tuneye. Her der hişk û germ û sinciriye. Mejiyê mirovî li serê mirovî da

diqijile. Hindî karwanê kurên Werdekê berjêr diçe, hind diçe hewa germ

û germtir dibe. Çiya dibin kolotên rûte xîzê. Çi deng û bas li çem û kaniyan niye. Ji bilî xîzê û xîzistanê tişteke dî li ber çavan nakeve.

Erd û

esman bînanî sêlên sor sincirîne. Ba nayê. Her cara ko bê jî, weke guriyên

agirê kûrexanan davêje nav çavên mirovî. Hindik dimîne rû simbêlên

mirovî bikuzirîne. Eve demanê çend rojane ko çiya û mêrg û çîmen û

daristan li pişt serê xwe ra hêlane. Hindî çav qeter dike, deşteke rip û

raste. Mirov ko weha li binê deştê dinihêre, tişteke wekî avê li ber çavên

mirovî dikeve. Erê tişteke wekî çemekî, wekî cobareke avê, cobarek  
ava  
şîn, wekî maran li binê deştê da, ew cîhê ko mirov we hizir dike êdî  
ku-  
taya deştêye, cobareke şîne avê çivana dide xwe û ber bi binê deştê  
dişû-  
like. Kerr li pêşiya karwanî ketiye. Daliqiyayî, daliqiyayî, daketî  
daketî  
pêş da diçin. Eva du roj in pêroyên wan av nevexwarine. Bixwe jî  
her  
wisan. Kef li ser devên hesp û hêstir û hêştiran ketiye. Hêstir li  
besteke  
weha da eger çendîn rojan jî bêav bimînin, êh li ber çavên wan ra  
nayê.  
Lê hesp û hêstir berewajî wan divê ko layê kêr rojê du sê caran  
bêne av-  
danê. Ew jî li wê germiyan û bejiya bê av da. Li danê havînê û li wê  
besta  
germ û li wê hewayê wisan cigersoş da hesp ko qet çî giyanlibereke  
dî jî  
tab nake. Bona van ajalana agir li serê Kerr û hevalan ketiye. Li ber  
tîh-  
nîtiyê dev û lêvên wan bizmirîne. Raste ko çar meşkên tijî av li ser  
piştê  
pêroyane, lê li tirsê roja reş da, dest li ava meşkan nadin. Nizanin yê  
çî  
bikin. Her tenê bi milê rê ra girtine û pêş da dikudînin. Ber û best  
tev da



xîz û xîzistan e. Xîz li saxiriyê hespane. Lingê hespan ta fêza çokan li xîzê

da çik dibin. Xîz wisan hûre tu dibêjî, ko li elek û bêjîngan dan e. Tu  
304 BILÎCAN

dibêjî dabêtine. Xîzeke hişk û zuha. Li ber bêhna bayê bilûrê jî xîz wekî

siwaran li rê dikeve û li dora tûmên qîvar, devdîş, hewşan û deven-  
deştiyên ko bi fersexan dûrî hevdu rawestan e, berev dibe. Eger ba qasekê

bidomîne, her di gavekê da, ew tûma devenê, ew qola qîvarê, ew bistika

devdîş û hewşanê li bin xîzê da wenda dibe. Xîz berebere li dora wê tê hev

û ewê li bin xwe da bezir dike û girekekî biçûk li ser bêhna wê serast dike.

Tu dibêjî ewê bi dest gor dike. Her di gavekî da besta qîvar û hewşanê

dibe girik û topikên xîzê û mirov dibêje qay qet li dirêjaya mêjûyê da çi

tişt ji bilî xîzê li wê derê tunebûye. Her di gavekê da ew tûm û qolên heyî

jî li ber çavên mirovî bezir dibin. Erê çol û çolistan berî û berîstan, xîz û

xîzistan, xîz li ser saxiriyên hespan, sêfil û sergerdan, kes nizan Xudê dizan. Hînga sal û deman, niha bi zar û ziman. Taze serê kurên Werdekê

ketibû, qax û bendên giran.

Li vê besta bêav û bêday û bav da, her tişt dijî şînbûn û pervedan û zêdekirinêye. Li besteka weha da çî tişt neşê şîn bibe. Eger qîvarek, yan tûmeke hewşanê, jî serê xwe li nava xîzê da derêxe, gereke çendîn gezan reh û rîşalan bavêje binê erdê, li kûraniya sîngê erdê da çeng vede, wisan berk û bitew bibe, ko bikaribe serê rîşalên xwe bikute erdê û xwe bigehîne nema binê erdê û bişê bo demekê li ser piyan bimîne. Lê dîsan jî eger bayek bê, yê her di gavê da serê wê li bin xîzê da çal bike. Yê ewê li bin xîzê da binpeç bike.

Zimanê karwaniyan li devê wan da reş bûye. Bûye kevir. Rast e çar meşk ava wan heyê, lê dil nadin dest li wê avê bidin. Ew ava germ û girav ji bo roja reş hildane. Ji paşeroja bêomidiyê ra hılanîne.

Nîveka nîvro û êvarê bû. Kerr li pêşayîka karwanî rawesta û bi heji-yareya destê xwe binê beriyê nîşanî hevalan da û got:

Hevalino! Mirov dibêje qay a, ewa hane, dîna xwe bidinê, a, ewa binê deştê da, a, ewa hane ko diçilvile, kanî yan çem e.

Evdurehmanê Terikî gotê:

Kerr ew leylane, leylan!

— Na, leylan nîne. Leylan naçilvile. Ev diçilvile. Rewneq dikevê. Dide nava çavên mirovan. Ezê ber bi wê avê, yan wekî te gotî ber bi wê leylanê

herim. Eger av bû, ezê bêm û we pê bihesînim. Av nebû jî gereke  
em  
çareyekê bikin. Hûn jî hema bidin ser vê şiverêkê û bikudînin. Li rê  
dernekevin ha. He we li nava xîzistanê da rê bezir kir, êdî zor dijwar  
e ko  
hûn bişên rêka xwe careke dî peyda bikin. Ne dar û bareke, ko mirov  
ji  
xwe ra bike nîşan. Ne jî girik û topik û kevir û kuçikek heye. Her der  
bî-

305

BILÎCAN

nanî hev in. Rast bi milê rê ra bigirin. Agaya we ji hevdu hebe. Eger  
jî ba  
li we rabû, û we nikarî hûn rêka xwe bidomînin, her yek ji we  
perûyekê  
bi serê rimên xwe va bikin û li cîda rûnên û terka hevdu nekin. Lê bi  
min  
wereng bagera xîzê yê çê nebe. Hewa sayiye. Dê îca bi xatirê we.  
Kerrî ev got û zengî li Sosikê da û berê Sosikê da wê ava ko li ber  
çavên  
wî ketibû. Li hindek ciyan da lingên Sosikê ta kaban li xîzê da çik  
dibû.  
Sosikê bi zorê lingê xwe ji xîzê der dixist. Lê li hindek ciyan da xîz  
hindik  
bû. Kerr li nava toz û dûmanê da li ber çavên hevalan wenda bû.  
Toza li

ber simê Sosikê li hewa ket û bînananê dûkeleke gewir xetek kişande  
pêsîra  
deştê û ber bi asimanan quloz bû. Piştî demekê ewê dûkela gewir ji  
hev  
berda. Bayek rabû û cîhan reş û tarî kir. Li her alî dûman quloz bû.  
Bû  
xuşîna xîza hûr û xîz li rê ket. Xuşîna xîza hûr bû, li ber simên  
pêroyan  
radibû û berî wan dikete serê rê û ser hev ra diqulibî. Li demekê da  
besta  
xîzê weke deriyayeke bêbin pêl veda. Pêlan li ser hevdu ra davîtin û  
hevraz  
û berjêr li hev digeriyan. Lemelema deriyaya xîzê bû. Şepêlan li se  
hev ra  
diavîtin. Ba berebere tundtir û gujtir dibû. Bû oreora hêştiran û  
hîrehîra  
hesp û hêştiran. Qentera hêştiran rast ketibûn rê û diçûn. Lê hesp  
nikarîn  
pêş da biçûyana. Hesp û hêstir li nava bagera xîzê da li hev aliyan.  
Seroqûno bûn. Karwanî neçar man, li hespan peya bûn û hesp  
destkêş  
kirin û ketin dû hêştiran. Lê hesp û hêstir li dû wan nedîçûn. Hîrehîr  
û  
fîrefîra hespan bûn û şeh radibûn. Ba lev zivirî. Bû firtone û bagera  
xîzê.  
Bagerê her alî reş û tarî kir. Karwanî neçar man, hêstir yêx kirin.  
Hefsarê

hespan avîtin cihazên hêştiran û çawa ko Kerrî gotibû wana, her yekê  
perûyekî sipî bi serê rimên xwe va îşkeîşk girêdan û binê rîman danîn  
erdê û serê rîman li hewa girtin û hemû berevî ser hev bûn û serên xwe  
dane ser hev û li ber pesêva hêştiran da rûniştin. Bayê dil hebû kum û  
kolozên wan li serên wan birevanda û lêdida rim li destên wan da vî alî wî  
ditewand. Dikir ko rîman ji destên xudanan derîne. Lê her yek bînanî  
qirniyê bi rimên xwe va zeliqîn. Destek li rîman û yek li kum û kolozan.  
Hindî zora wan hebû, rimên xwe tund li destên xwe da girtin û kum û  
kolozên xwe temisandin serên xwe û li ber xwe dan û nehîştin rimên wan  
ji destên wan û kumên wan ji serên wan bikevin erdê. Bû şelp û telpa  
perûyan û hesp pêş da lê silikîn, lê paşê hêdî hêdî em bûn. Ba hindî diçû  
gujtir dibû. Weke lêmişteke tund xuşîna xîzê bû. Xîz li dora wan ra bû  
çenber. Bayê lêdida û xîz li dora wan û pêroyan da berev dikir. Ew alayên  
sipî ko bi serên rîman va hatibûn darda kirinê, her yek bînanî kotirek ser-

jêkirî vî alî wî alî per lê didan û li ber giyanê xwe didan û xwe diçirçi-  
306 BILÎCAN

randin. Cîhan wisan tarî bibû ko kesî kes nedidît. Dilên wan li sebeda  
sîngên wan da tundetund dikuta. Bêhna wan çik dibû. Xwelî û toz û  
xîzê

xwe davîte ser çavên wan. Dev û lêvên wan li ber tînîtiyê û li ber  
tozê hişk

bibû û bizmirî bû. Tuf li devê wan da bibû mast. Dema ko hewa lap  
tarî

bû hemûyê dest ji ber xwe hildan û kesî bawer nekir ko dê giyanê  
zindî ji

vê bagerê rizgar bikin. Her yekê li tirsê giyanê xwe da qiseyek  
diperand.

— Em çûn.

— Êdî rizgariya me tune.

— Xudê tofanê me hemûyê bixendiqîne.

— Kuro em her vaye niha da difetisin.

— Kerê malava jî ji me qetiya.

— Erê lê dîsan hema em li ba hevdu bimirana.

— Kuro bes e xeber nedin, xîz tijî devê me bû.

Eva Evdurehmanê Terikî bû ko pê dermilka kurtikê xwe xîza ko tijî  
de-

vi bibû, deranî. Kir ko tuf bike. Lê çî tuf li devê wî da nemabû. Pê di-  
danên xwe zimanê xwe verot û bi lêv û didanan xîza li devê xwe û li  
ser zi-

manê xwe da avîte derva. Hemûyê serên xwe kutabûn li ser hev.  
Bêhna

helka wan tevî hev dibû. Li ber bêhnê xûyî didan. Xîzê ta nîvê leşê  
wan  
dagirt. Ta qefesa sîngê wan li jêr xîzê da ma. Hêdî hêdî xîz ber bi  
qirika  
wan dihat û ber bi serê wan hildikişiya. Berpişt û berîkên wan tijî xîz  
bû.  
Fişe fişa wan bû. Piştî demeke xurt ba hêdî hêdî rawesta û berebere  
bagerê  
danî û hewa kûşkê ronahî bû. Tav li esmanî da, li pêşberî wan weke  
çi-  
rayeke tozavî hate xûyanê. Toz û temê hêdî hêdî vekir. Karwaniyan  
serên  
xwe li ser hevdu rakirin. Li nav çavên hevdu nihêrîn. Şabûn. Li hevdu  
girnijîn û bîzorê karîn xwe li nava xîzê derînin. Bi kul û halan rabûn  
ser  
piyan. Aliyê berbeba xîzê li ser kûfana hêştiran ketibû, lê aliyê  
pişteba xîz  
hiniktir bû. Hêştir rakirin. Bû fîrefîra hespan û difinên xwe paqîş  
kirin.  
Gava ko hêştir rakirin, dewsa wan koreka mezin serast kiribû.  
Nîvçalek  
gurover. Bînanî goreke komelî. Gorteke tabayî. He rastî jî taze li nav  
gor-  
inê derketibûn. Taze ji gorê rabibûn. Dilka wan dikuta. Ser û rûyên  
wan  
li ber tozê û xweliyê nedihate xûyanê. Pirça wan gewir û boz dikir.  
Evdurehman li korikê mêze kir û got:

Xudê kem eger her nîv demjimêrên dî jî bidomanda, em hemû li vê ko-

rikê da miribûn. Qet kesî termên me jî peyda nedikir.

Neimetê Îsi got:

Xudê gumgumokan dê em bixwarana.

Buxdoyê File got: Gumgumok canewreke pir bêgunehe.

307

BILÎCAN

Neimet xwe li ser va nebir û bersiva Buxdoyê neda.

Li dû Buxdoyê ra Êxo keniya û got:

Neimet Xudê kem, ez li dewsa gumgumokan giftê didime te, çî gumgumok goştê te naxon.

Neimetê Îs bi vê yariya Êxo pir aciz bû û xwe lê pert kir û gotê:

— Êxo dibêje qay tu zêdegaviyan dikî, ha.

Evdurehman gotê cihe Neimet Êxo yariyan dike. Dîsan bixwe jî keniya

û got:

— Xudê kem ez jî li batî gumgumokan giftê didime te.

Hemû tev kenyan. Neimet jî bi neçarî bi wan ra keniya.

Kuliki destûr da:

— Em gereke rê kevin, hê ko tarî neketiye erdê.

Her kesî serê hespê xwe ra girtibû. Lê çî rê û dirb nedihate xûyakirinê.

Bagera xîzê rê û ban hemû wenda kiribû. Nizanîn yê li kî alî da herin.

Kûşkê hizirîn û dîna xwe dane dor û berên xwe. Her der hatibû guherînê.



Li wê besta rip û rast da, bi hezaran topikên xîzê mil kutabûn hevdu  
û ber  
û best dabûne ber xwe.  
Kuliki li dor û berên xwe nihêrî û got:  
Başe ew aliyê hanê ko tav hindik maye bi deştê va bizeliqe, rojava  
ye. Ev  
aliya jî rojhelat e. Gava ko em li rê dabûn rojava li milê me yê rastê  
û ro-  
jhelat jî li milê me yê çepê da bû. Wisan be, pêşberî me jî başûre. A,  
em  
gereke weha rast herin.  
Hemûyan gotinên Kuliki rast derêxistin û ber bi başûrê rê ketin. Lê  
rê-  
ka çî! Halê çî!! Ji bilî topikên xîza elekkirî çî tişt nedihate xûyanê.  
Rast bû  
ko li tirsî bagera xîzê hemûyê xwe li ber pesêva hêştiran da  
veşartibûn, lê  
dîsan jî bêhna xwe standibûn. Hindî ko ba û bager bû, li tirsî giyani  
da  
tîhîti nedikete bîra çî kesî. Lê, gava ko li buveya bagerê rizgar bûn,  
dîsan  
tîhnîtiyê li hemûyê seh kir. Tûk li devê hemûyê da meyîbû. Kulik li  
pêşiya karwanî rawesta û got:  
Êdî em tîhna nikarin rê herin. Hêştira pêşîn hîş bikin, her yek me  
qurtek av li devê xwe werde, paşê em li rê bikevin. Bi gotina Kuliki  
ra  
Evdurehmanê Terikî, hêştira pêşîn hîş kir. Barê li ser piştî wê vekir.  
Her

du meşkên avê li ser barê wê anî xwarê. Evdurehmanî tasikek hilda  
û serê

mirovê nîv tasik av dayê û got:

Kuro pêş da gulpekê li devên xwe werdin û birijînin û paşê vexon.

Bi

vebûna derê meşkan ra hemû şa bûn. Her yekê xeberek digotin:

— Kuro nehêle bihirşe, heyfe.

308 BILÎCAN

— Kuro her gulpekê tenê li devê xwe werde. Te av kuta kir.

— A, Kerr jî niha tîhnî ye.

— Erê lê ew jî niha tîhnî ye.

— Baş e em ko avê kuta nakin.

— Na, na ava me têra me deh rojan heye.

— Me nizanî ka Kerr kû da çû!

— Her li kêderê hebe, dê bê û me peyda bike.

— Erê Sosikê bêhna me hilde û bê û me bibîne.

Gava ko av vedixwarin, çavên pêroyan li destên wan bû. ewan pê  
çavên

xwe ava para xwe dixwastin, û bi zimanê bêzimanan digotin, ne em  
jî bî-

nanî we tîhnî ne. Hemûyan ev gotinan li çavên wan pêroyana da  
dixwendin, lê kesî xwe li ser wê hindê da nebirin. Evdurehmanê  
Terikî

dîsan bînanî pêş da devên meşkan baş girê da û hevalan alî wî kirin  
û

meşk dîsan avîtin ser pişta hêştirê. Hêştir rakirin û pêkve deşt dane  
ber

sîngê xwe û pêş da çûn.

309

BILÎCAN

40

Hewşan giyayekî gewireşîne. Rengê hewşanê tûsî ye. Bilindaya wê  
gorekî

cîhê ko lê şîn dibe, ferq dike. Li navçên çiyayî da, bejna wê gelekî  
bilind

be, sê yan çar bihost e. Lê li navçên germ da hewşan bejn vedide û  
nêzîkî

gezekê jî bilind dibe. Bistiyê hewşanê şax şaxî û pelgên wê hûrik û  
gulên

wê yên gewrik jî guşîkîn e. Lê berewajî dîtir giyayên guldar gulên  
hewşanê li seranserî bistik û şaxên wê da dibişkivin. Bistikên  
hewşanê zi-

rav û nazik in. Rengê gulên wê, yan çawaniya gulê wê giring nîne.  
Lê tiş-

ta ko taybetmendî daye giyayê hewşanê bêhna wê ya tund e.  
Dibêjin kêz

û kurm û mişk û mar ji bêhna hewşanê direvin. He li ber wê hindêye  
ko

gava hewşan du sê bihostan bilind dibe û gulên wê yên hûrik taze  
dixwazin bibişkivin, gundî û koçer deste deste diçin berev kirin, yan  
li ser

gotina wan bixwe çinîna hewşanê. Bistikên hewşanê ji rîşal da  
derdixin,

yan jî pê dasikan didirûn û ewê gurz gurzî dikan û dibin malên xwe.  
Li  
nav hewşana çinî da, ew bistikên wê yên dirêj û stûr ji yên dî  
vediqetînin  
û li ser banan radixin, ta ko li ber tavê hişk bibe. Gava ko hişk bû,  
kêzikan  
jê çê dikan. Lê ew bistên dî jî hema wisan tereter li bin nivînan  
radixin û  
dibêjin hewşan rîşala kêz û kurman diqelîne û bi taybetî jî kêçan  
rehbir  
dike. Ca li naverasta meha buharê ya kutayê da, tu derê mala kêşk  
koçer  
û gundiya ve dikî, bêhna tund e hewşanê dide serê te. Bêhna  
hewşanê ne  
bêhneke wisan tunde, ko li mirovî bigire, lê ne jî bêhneke gulavîn e.  
Bêhna wê tişteke mirovî mest û bêhal dike. Lê ta roja îro kes salixan  
nade,  
ko kesek yan ajeleke malî bi hewşanê ketibe. Tenê hewşan  
dermanê re-  
hbirkirina kêçan û dîtir kêz û kurmane. He li ber vê hindêye ko koçer  
û  
gundî gêzikan li hewşanê çê dikan. Da ko gava malê bi wan  
vedimalin,  
bêhna wan li erdê malê da bigere û cir û canewerên pintû û buvedar  
ji  
holê rake. Hindek mal jî navaxina doşikan li hûrikên hewşanê  
dadipirînin û dibêjin kêç û kêz û kurm nawêrin li ser wan doşikana  
bikevin.

Xezal gelek caran li ber siya hewşanê dizên û mexelê karên xezalan  
gelek

ciyan da li nava tûmên hewşanê da ye. Hewşan li lêmiştgeh û  
xîzistanan

310 BILÎCAN

da, li rex qîvar û kerengtûsiyan da hêşîn dibe. Hewşan, germiyanê  
bere-

wajî hewşana çiyar qol qoliye. Qolên wê dikarin siyeke baş serast  
bikin û

eger keriyên bizinan lê nehewilin, ta naverasta havînê jî, dimînin.

Gava ko Kerr ji hevalan qetiya, berê Sosikê da wê ava ko dîtibû. Lê

hindî Sosik dikudand û diçû, bi wê avê ra nedigihîşt. Hindî zengî li

Sosikê dida û dihajot, hind diçû ew coka şîn jî li ber çavên wî dût  
diket û

ji wî direvî. Lê Kerr bê hîvî nedibû. Terka wê avê nedikir. Ew serok û  
berpîrsê karwanî bû. Perîşan li mal da li hîviya wî maye. Çav li rê ye.

Bi

her cureyî divê ko avê ji hevalan ra, ji pêroyan ra, ji xwe ra peyda  
bike.

Eger kaniyekê, golavekê, golmancekê jî peyda bike, ji mirinê filitîne.

Rizgar bûne. Gihîştiye beriya Şengarê û Bilîcan ji Emer Axayî ra  
haniye

û li Perîşanê bûye xudan. Kerr li vê bîr û hizrê da Sosik zengî dikir û  
pêş

da diçû. Sosikê xîza elekkirî diqelaşt û pêş da diçû. Da ko Kerr  
giheşte

besteke seranser hewşan û kerengtûsî. Hindî çavan qeter dikir,  
tûmên  
hewşanê û kerengtûsiyan bûn ko mil kutabûn hev û berva diçûn.  
Hindek  
ciyan rixtim û li hindek ciyan jî sêrek. Taze qelûnkêşek, yan du  
qelûnkêş  
dibû ko ji hevalan qetiyabû ko bayekî sivik, nermebayekî germ  
vizandê.  
Bi rabûna bayê ra gijên kete besta hewşanê. Hewşana şîn û  
kerengtûsiyên  
tûsî weke deriyayeke pêlawî hurmicî. Durust bînanî deriyayeke pir  
şepêl  
û tûre pêlan li ser pêlan ra dihavît. Kerrî Sosik li besta hewşanê da.  
Giheşte naverasta bestê. Nişkava bû şingîna karexezalekê û li ber  
Sosikê  
rabû. Gava ko çavên Kerrî bi karxezalê ket, desthelatdariya xwe ji  
dest da.  
Kerrî nivê temenê xwe li nêçîr û nêçîrvaniyê da bihorandibû.  
Nêçîrvanî  
jê ra bibû xûyekî hemêşeyî. Bêhemdê xwe berê Sosikê da ser kara  
xezalê.  
Kara xezalê bînanî bayê bezê li ber Sosikê direvî û li nava besta  
hewşanê  
da çerx lê dida. Lê Sosik jî hema li dû wê bû. Kara xezalê dor lê dida.  
Li  
hev digeriya û xwe li ber lingên Sosikê ra dikir û rêça xwe diguhest.  
Lê

Sosik jî hespa nêçîrê bû, hema li ser bêhna wê bû. A, li vira na, li dera han,  
hema hindik dima ko pê ra bigihîsta. Lê kara xezalê dîsan çivane dibû û  
rêç diguhest. Kara xezalê du sê seriyên li nava besta hewşanê Sosik li dû  
xwe ra gerand û paşê li besta hewşanê derket û berê xwe da besta xîzê.  
Dûman li ser bestê ket. Kerr û Sosik û kara xezalê li nava toz û dûmanê  
da hevdu wenda dikirin. Kara xezalê sê çar seriyên jî li besta xîzê da Sosik  
çerixand û li dû ra xwe avîte nava qîvaristanê. Karê li ser çend tûmên qî-  
varan ra qewş dikir. Sosikê jî durust bînanî wê li ser tûmên qîvaran ra  
banz dida û simên xwe didana dewsa simên wê. Kara xezalê xwe davîte  
nav qetên tûmên qîvaran û dor lêdida. Sosikê jî bêhna nêçîrê kiriye,  
qet

311

BILÎCAN

serî li ser rêça wê nahilîne. Sosik li canîtiya xwe da fêrî nêçîrê bûye. Nêçîrvanî ji wêya ra jî bûye xûyek ji xûyên neterikandî. Lê ew ta roja îro  
rastî nêçîreke weha beza û bi çift nehatibû. Dirik û qîvaran pelek û

saxiriyên Sosikê didirandin. Lê êh li ber çavên Sosikê û Kerrî ra nedihat.

Herdu jî bi kara xezalê ra ketine înkê. Hindî bêhna xûnê dida serê wan,

hind diçû ji bo girtina nêçîrê tamarezûtir dibûn. Kara xezalê li nava qî-

varistanê derket û dîsan xwe avîte naverasta xîzistanê. Kara xezalê sivik

bû. Weke çawa pelgek li ser deriyayê dikeve, wisan li ser xîzê ra dişûlikî.

Lê Sosik, Kerê pehlewan li ser piştê bû. Gelek ciyan, ta çîpan li xîzê da çik

dibû. Lê dîsan jî li ber xwe dida û çav li ser kara xezalê ranedikir. Li du sê

ciyan Kerrî kir ko kara xezalê bide ber reşêşkên tîran. Lê kara xezalê bî-

nanî bayê bezê dibezî. Ta Kerrî bijangên xwe li hev bida, karê li ber çavên

wî wenda biba. Kerrî li ber lêva xwe da bi kîn û kerb got:

Hey la bêxudanê! Yezdan kem hez kî min giyanê xwe û Sosikê jî li ser

te danabe, taze ez dest ji te nakêşim.

Kara xezalê piştî çend ger û çivên pêçane, berê xwe da rojava. Li çav-

girtinekê da best kuta kir û xwe avîte nava xilxilên sipî. Ewê dixwast, xwe

bavêje çepan û xwe li nepeniyan da li ber çavên nêçîrvanî bezir bike.

Li



xilxilên sipî ber bi rizdeberan şûlikî. Li rizdeberan xwe avîte kevirê  
çeq-  
mağan. Li kevirê çeqmağan xwe avîte girê Bûdo. Li girê Bûdo xwe  
avîte  
mexelê pezkûviyan. Li mexelê pezkûviyan xwe avîte qîracê daran.  
Li  
qîracê daran xwe avîte besta dirîreşkan. Li besta dirîreşkan li nava  
dirî û  
dar û devenan da, çivane da xwe û ber bi besta xezalan şûlikî. Li  
besta  
xezalan dîsan xwe gîhande besta xîzê. Dîsan li besta xîzê xwe avîte  
besta  
hewşanê. Sosik û Kerr jî hema wisan li ser bêhna wê ne. Li besta  
hewşanê  
jî dîsan weke cara pêşîn xwe avîte nava rizdeberan. Li ser berekî  
banz di-  
da ser berê din. Lê Sosikê jî per deranîbû. Ew jî hema li dû wê bû.  
Li nîva rizdeberên sipî da aveke zipezelal hindî lûlikê lûlehengekî jor  
da  
dikişiya. Lê evîna girtina nêçîrê, av çî ye, her tişt ji bîra Kerr û Sosikê  
biribû. Herdukan qet avirek jî nedane avê. Fîrefîra Sosikê bû, li ser  
ke-  
virên çeqmağan ra qewş fikir. Taze berê guçkên Sosikê ter dibû ko  
kara  
xezalê li sebedê da. Karê bihostekê zimanê xwe deranîbû. Nava wê  
bînanî  
tufika asinkeran radibû û rûdinişt. Sosik hema li ser bêhna wê bû.  
Karê

berê xwe da serhevrazekî û bînanî bayê û birûskê diçû. Sosik jî hema  
li dû  
ra. Kar giheşte serê milê. Lê dîsan jî peyakê mirinê li dû wê ra dihat  
û dest  
jê nedikişand. Sosik li ser kevirên sipî ra banzdida û agir li ber nalên  
wê  
difirî. Kar li milê da serberjêr daket. Sosikê jî da dû wê. Bû firîna  
nalekî  
312 BILÎCAN

Sosikê û li ber guçkên Kerrî ra derbas bû. Lê Kerr her tişt ji bîr kiriye.  
Ji  
bilî girtina kara xezalê li bara çî tiştî da nahizire. Tu dibêjî qay her li  
zozanan ra bona girtina vê karê rê ketiye. Kar li gelî da serberjêr bû.  
Li ser-  
berjêri da, du sê caran lukumî. Girêl bû. Lê dîsan rabû ser piyan û  
bezî.  
Tirsa giyani hêza wê zêde û zêdetir kiribû. Giyan şirîn e. Ewê teterê  
mir-  
inê li raserî serê xwe ra didît. Dalaşê nemanê li ser giyanê wê penc  
vedabû.  
Li dora serê wê ra ger lê dida. Diçerixî. Lê hindî hêza wê hebû, dida  
lingên xwe û pêş da diçû. Li ser kevir û li ser kendalan ra, li ser deven  
û  
daran ra, li ser qolên qîvar û tûmên dirikan ra cotkî banz dida. Sosikê  
jî  
hema bînanî wê. Karê ling radikir ewê lingê xwe didanî dewsa lingên  
wê.

Kara xezalê bi lukumîn û banz û girêlbûn giheşte binê geliyê. Dîsan  
berê  
wê kete serhevrazekî dî. Herdukan pêkve serhevraz kuta kirin.  
Herdukan  
jî bi tundî li sebedê didan. Fîrefîra difina Sosikê bû. Kara xezalê jî  
fîşefîşa  
bêhnê bû, ko li pozan ra davît. Kerrî ev herdu deng jî dibihîst. Li serê  
hin-  
givokê Sosikê xwe da ber guçkên kara xezalê. Kara xezalê dîsan  
weke  
çendik û çend caran xwe li ber ra kir û dîsan kete serberjêrî. Sosik jî  
dîsan  
weke çendik û çend caran li ser da tewiya. Herdu weke cotek cokên  
avê,  
ko li serberjêrekî reqî rût da bişûlikin, ber bi jêr şimitîn. Kara xezalê  
dîsan  
lukumî. Hol bû û şiqitî binê geliyê. Li binê geliyê da, Sosikê xwe da ser  
bêhna wê. Kerr jî ko gopalê zîvîn li destî da bû, gopal avîte stuyê  
kara  
xezalê. Karê xwe lemisand û gopal li ser pişta wê ra şûlikî.  
Helkehelka sê  
sebedên sîngan bû. Hersêkan bi hev ra li sebedê didan. Berê xezalê  
dîsan  
kete serhevrazî. Kara xezalê li ser hevraz da dil hebû per derîna û fir  
bida.  
Sosikê jî bîna wê per derîna bû. Kerr jî hema wisan gopal amade  
girtibû.

Neh deh pêngav mabû, ko kara xezalê li ser biketa ko Sosikê xwe pê  
ra gî-  
hand. Hindik mabû ko kara xezalê biketa nav dest û piyên wê. Kerrî  
serê  
wê li ser karê wê da da û gopalê xwe avîte stuyê karê. Vê carê gopal  
li stuyê  
karê da çik bû. Li gerdena wê da asê bû. Karê xwe gijgijand û xwest  
xwe  
li gîra gopali derîne, lê nedikarî. Kerr li ser pişta Sosikê xwar bû û  
destê  
xwe li pişta karê da cî kir û kar rakir danî nîveka xwe û qaşa zînî da.  
Dilê  
karê hind tund lê dida, te digot hema ha hane ko dilê wê weke  
cûncikekê  
li qefesa sîngê wê derkeve û bifire derva. Gurpegurpa sîngê wê bû,  
zimanê  
xwe bihostekê ji devê xwe deranîbû. Zimanê wê hişk û reş bibû.  
Gava ko  
Kerrî ew dana nîveka xwe û qaşa zîn, du hêsirên zirav li kaniya çavên  
wê  
jor da şûlikîn û li nav pirça nerm û tiftîkiya rûmetê wê da wenda  
bûn.  
Kerrî destên xwe li ser pişta wê gerand. Pişta wê hulo û qelew bû.  
Têra  
wan îşev dikir. Sosikê jî hê dikire fîrefîr. Sosik li xûyê da reş bibû.  
Kerr  
313  
BILÎCAN

hêdîka li serberjêri da şûlikî nava kevirên çeqmaqan. Rizdên  
berezîvan  
mil kutabûn hev û hindî ko bi Kerrî va dihate xûyanê, berve diçûn.  
Zangek bilind ko ji tateberekî sipî û yekparçe pêk hatibû, li himberî  
Kerrî  
da dihate xûyanê. Li binê zangê da kevir li ser hev da hilcinîbûn û  
hewşeke biçûk çêkiribûn. Binê zangê wisan kor da çûbû, ko te digot  
qay  
bi dest xeritandine û sîvankek li ser hewşê serast kirine. Kaniyeke  
zelal li  
binê zangê da hildikeliya û ava wê dikete nava kevir û kuçikan û  
berjêr  
dikişiya. Kerrî Sosik ber bi wê kaniyê hajot. Li ser kaniyê peya bû û  
nêçîra  
xwe danî erdê. Nêçîrê xwe li nav destên wî da hilavît û bû mikemika  
wê.  
Nêçîrê dil dikir ko xwe li nav lepên Kerrî rizgar bike. Lê Kerrî kelên  
ne-  
dayê. Bi destekî bi çîpa wê ra girt û bi destê dî Sosik qaş kir û her  
wisn  
ko bi destekî li çîpa karxezalê ra girtibû, bi destê dî li ber piştta xwe  
li  
xencerê xebitî. Xencer ji kalanî kişand. Xencera wî li ber tava rojava  
çil-  
vilî. Rewneqa xencerê kete çavên xezalê. Rewneqa çavên xezalê  
kete ser

xencerê. Rewneqê li ser rewneqê da spêne kir. Lê Kerrî qet ew herdu  
rewneqana jî nedîtin. Nêçîr rakir û li erdê da. Bû barîna nêçîrê. Kerrî  
xencer dana ser skura wê û li skura wê helsût. Bû fîşqîna xûnê û li  
skura  
xezalê ra fîzikande derva. Digel fîzikandina xûnê dîsan bû barîna  
kara  
xezalê û bi tundî lingên xwe li erdê da. Paşê bi tundî lingên xwe li  
hev  
sûtin. Li dû ra hêdî hêdî lingên wê lerizîn. Xûn ji ber kişiya. Xûna wê  
li  
nav qetên çirgeya li rex kaniyê da wenda bû. Kerrî li dû ra xencer li  
îlika  
wê xist. Gava ko Kerrî îlika wê jenî. Karê bi tundî xwe çirçirand.  
Lingên  
xwe li erdê dan. Serên simên wê çirge verot û xetek kişande ser  
erdê li rex  
kaniyê. Kerrî serê wê jê kir û danî li rex cendeki. Karxezalê hê jî devê  
xwe  
digirt û vedikir. Kerr xencera xûnavî li desti da hate ser kaniyê. Taze  
de-  
ma ko çavên wî bi ava zela ket, zanî ko ji bo peydakirina avê ji  
hevalan  
qetiyaye û bixwe jî seha tîhnîtiyê kir. Xencera xwe danî rex kaniyê û  
qurûyî avê bû. Du bêhnê tu bêjî av vexwar. Li ser kaniyê rabû. Pê  
pişta  
destê xwe dev û simbêlê xwe paqîş kir. Av tişteke tund bû. Tama  
wê talî

û şorî va dihingavt. Lê ne hind şor bû, ko mirov neşê vexwe. Kerrî  
destê  
xwe avîte xencera xwe û xencer pê ava kaniyê baş şoşt û pê pirça  
pişta  
karxezalê hişk kir. Dîsan xencera xwe li kalanî da cî kir û li ber pişta  
xwe  
da ediland. Kef li ser devê Sosikê ketibû û hema wisan qaş kirî li cî  
da xwe  
difirikand. Kerr giheştê û gema wê li ser pişta zînê wê da, vekir. Gem  
li  
serî deranî û bi hefsarê wê ra girt û ew hanî li ser kaniyê av da.  
Sosikê du  
bêhnan av hilçinî. Kir ko bêhna sê yê jî avê hilçine, ko Kerrî nehîşt û  
li ber  
xwe da got: Sosik tu westiyayî. Eger tu gelekî vê ava tal û tund  
vexoy, avê  
314 BILÎCAN

li te bigire. Kerrî dîsan Sosik gem kir. Bi dizgîna wê ra girt û ew li dû  
xwe  
destkêş kir û tişteke hevraz hilkişiya û li dû ra destê xwe avîtê û  
dûrbîna  
xwe ji xurcika terkiya Sosikê deranî û li rêka ko tê ra hatibû mêze  
kir.  
Kerrî hindî pileya dûrbînê serast kir û li rê nihêrî, çî tişt li ber çavên  
wî  
neket. Li dû ra hema li wê derê Sosik qeyd kir û gema wê li serî  
deranî û

ew cî da hêla û bixwe dûrbîn li desti da, ber bi serê zangê çû. Ta ko  
gihîşte  
serê zangê bêhna wî girt. Destê xwe da newqa xwe û hilkişiya ser  
bilindtirîn kimê zangê. Dûrbîn da ber çavên xwe û li besta hewşanê  
ni-  
hêrî. Dûrbîn li ser besta hewşanê rakir û li ser besta qîvaran mêze  
kir.  
Dûrbîn li ser besta qîvaran rakir û li besta xêzê mêze kir. Gelekî lê  
nihêrî.  
Ji bilî girikên xîzê çî tişt li bestê da li ber çavan nediket. Bagerê  
lêdabû, ew  
besta ripe rast, girik girikî kiribû. Bi dîtina wan girikana ra Kerrî zanî,  
ko  
bagera xîzê li hevalan rabûye. Pir nihêran bû. Dîsan dûrbîn gerand.  
Li  
binê deştê da tav hindik mabû ko bi deştê va bizeliqe. Tav bînanî  
sêleke  
sor dihate xûyanê. Bînanî sêleke sor, ko te taze ji ser agirekî gur  
hilanîbe.  
Durust bînanî xûnê sor bibû. Bînanî piloteke agirê gur sor dikir. Paşê  
berebere kimê tavê bi deştê va zeliqî. Tavê û deştê hevdu ramûsîn.  
Paşê  
hêdî hêdî tav dakete ser sîngê deştê. Berebere ew sêla sor durust  
nîvî bû.  
Tavê û deştê hevdu himêz kirin li dû ra guroverka tavê bû devdask.  
Li ku-  
tayê da ew devdasika jî li binê deştê da bezir bû. Kerrî dûrbîn li wê  
nuqtê



hilanî û li ser panatiya deştê da gerand. Li nava girên xîzê da,  
hemmanê  
tozeke zirav radibû hewa. Baş çavên xwe li ser dûrbînê da  
kuskusand û pi-  
leya dûrbînê hevraz û berjêr kir û bi zorê karî hindêk reşên bînanî  
rêzikên  
mêhrûyan bibîne. Çend reşan rêz dabûne dû hev û ber bi wî dihatin.  
Li zangê da jor da hat. Qeyda Sosikê ji lingê wê vekir. Gema wê li  
serû  
da û ber bi cendekê karxezalê çû. Cendekê karxezalê sar bibû. Xûn  
bi sku-  
ra wê va meyîbû. Ustuyê xezalê yê xûnîn temîz şoşt. Serê wê yê  
xûnavî jî  
şoşt û kire tayê xurcîkê û cendekê karxezalê jî avîte terkiya Sosikê û  
bi  
terkîbendan baş girêda. Xûya Sosikê hişk bibû û bi toz û qirêcê va bi  
leşê  
wê va zeliqîbû. Pirça wê ya nerme nol gulok gulokî bibû. Kerrî lingê  
xwe  
kire zengiyê û li ser piştê Sosikê ket û berê Sosikê berjêr kir û li nav  
çavên  
kevirên çeçmaqan da jor da daket. Berezîv kuta kir û dakete deşta  
hewşanê. Deşta hewşanê kuta kir û giheşte deşta qîvaran. Li deşta  
qîvaran  
jî derket û giheşte besta xîzê. Li binê besta xîzê aliyê çepê bêhneka  
genî di-  
hat. Lê Kerr li ser piştê Sosikê her di xema karwanî daye. Qet ewê  
bêhnê

li wî kar nekir. Cîhan jî êdî tarî bûye. Hindî gewriya Kerrî girt, navê  
Kuliki anî û gazî kir. Du sê caran li ser hev gazî kir û li dû ra xwe kir  
kir û

315

BILÎCAN

guçkên xwe dagirt. Piştî demeke kurt dengê li wî tesel kir. Deng  
nasî.

Deng dengê Kuliki bû. Zengî li Sosikê da û ber bi dengê hajot. Li mey-  
danekê da reşê qentera hesp û hêştir û hêstiran li tariyê da li ber  
çavaên wî

ketin. Bû şîhîna Nijdiyî. Sosik jî li bersiva wî da şîhiya. Kerrî dizgîna  
Sosikê ragirt û gazî kir:

Kuro hûn hatin?!

Sê, çar dangan bi hev ra li pêşberî wî bersiv dan:

— Erê erê, em hatin.

— Lê tu li kêderê bûyî?

— Te qet çi kir?!

— Te av peyda kir, yan na!?

Kerrî bersiv da:

— Erê, erê. Min kaniyeke wisan peda kiriye, ava wê tu dibêjî çirka  
şîre.

— Te li kêderê peyda kir?

— Waye li binê zangê da ye.

— Lê tu nîvro da li kê derê bûyî?

— Ez li nîvro da her li avê digirim!

Kerr çû giheşte karwanî û karwan da pêşiya xwe û ber bi binê zangê  
rênimûnî kir û pirsî:

Lê hûn çima hinde gîro bûn?!

— Mala te ava bûyî! Em ji mirinê rizgar bûne, ew dibêje hûn çima gîro

bûn? Lê tu qet napirsî, ka çi hatiye serê we?

— Baş e! Bêjin kanê çi hatiye serê we?

— Mala te yê, em ketin bagera xîzê. Hindik mabû em hemû li bin xîzê

da bimana.

— Hindik mabû me rêka xwe şaş bikira.

— Xudê her demeke dî jî bagerê bidomanda, em li binê xîzê da hati-bûn çal kirinê.

— De min jî got ka çi hatiye serê we! Li vê bestê da bagera xîzê tişteke

asayî ye. Ne hûn ko vaye tendurust hatine.

Bi gotin û axiftin pêro dane ber xwe û kudandin, ta ko nêzîkî bi kevirê

çeqmaqan kirin. Kerr kete pêşiya karwanî û ber bi binê zangê bir.

Pêroyên westiyayî bi zorê li nava kevir û kuçikan ra hildikişyan. Bêhna

avê kiribûn. Xwe bi lez ber bi kaniyê kişandin. Li nava keviran ra hilkişyan û xwe gîhandin kaniyê. Karwaniya serê pêroyan berdan û qurûyî

avê bûn. Pêroyan jî her bi gem û devgem û hefsaran va devê xwe li avê di-

gerandin. Lê av hind zor nibû ko li ber devê wan bikeve û devê wan tijî

316 BILÎCAN

bike. Ava zirav dikete nava qet û qelîştekekên keviran û bi taw berjêr di-

herikî. Hasûxan û Pasûxan zû bi kevir û gîha û çîman pêşiya avê xendiqandin û delavekî biçûk li ber kaniyê çêkirin. Av hêdî hêdî li delavi

da berev bû. Delav tijî av bû û avê li ser ra avît. Vêca hevalan yekoyeko

hesp û hêstir û hêştir li ser wî delavî av dan û pêroyên xwe têrav kirin. Li

dû avdana pêroyan ra ber bi binê zangê hilkişyan. Hîvê şîv xwaribû. Hîva çardê der û deşt tijî kiribû. Sîbera zangê dabû ser kaniyê. Hesp û hê-

stir li binê zangê da bi hev va girê dan. Kerrî got:

— Her kelmelan bikişînin vira! Vêca bi hejyareya destê xwe hewşa binê zangê nîşanî wan da.

Ewana li kişandina kelmel û girêdana pêroyan da bûn, ko bû şîrpîna cendekekê, li terkiya Sosikê li ser destê Kerrî kete erdê. Kerrî cendekekê

karxezalê danî rex kaniyê û got:

Ev jî şîva we ya îşev e.

Bi ketina cendekekê karxezalê ra hemûyan berê xwe dane Kerr û cendekekê

karxezalê.

Evdurehmanê Terikî got:

Beh beh karmamiz! Te li kêderê nêçîrê kir?!

— Li besta hewşanê. Goştê wê xweşe ne Evdurehman?

— Erê serê te! Biryana karmamizan zor xweş e. Ezê her nihe biriyanekê

jê çê kim. Têra me îşev heye.

Kerr û Evdurehman li axiftinê da bûn, ko Kulik hat û li ser serê kar-mamizê ra rawesta û got:

Xudê mala te kavi neke! Dibêje qay tu bi Werdekê ra ketiyê kînê.

Her

çiya ko Werdekê gotiye, tu berewajê wê dikî. Ne dayîka Werdek em şîret

kirin, gote me hespên xwe nevêjin dû karên xezalan. Ez nizanim tu çira

şîretên Werdekê pêpes dikî. Tu çima bi gura Werdekê nakî. Ne qaşoka

dayîka me, em şîret kirine! Ev hinde li van bestana nêçîr hene, her debiya

ko te Sosik li dû kara xezalê bixista. Tu her mirovekê çepaneyî.

Kerrî bersiv da:

— Kuro nêçîr her nêçîre. Çi kara xezalê. Çi golka gakûvî. He ev rastî min hat. Ez ko derneketibûm nêçîrê. Ez li avê digeriyam û ev rastî min

hat û min jî nêçîr kir. Nêçîr bixwe hate ser min. Ez ko li nêçîrê nedigeriyam. Lê evê komê yê îşev çi bixwarana Kulik?

Hemûyê gotinên Kerrî rast derxistin û her yekê tiştê gotin:

— Ma emê îşev birsî razana?!

— Ma me yê goştê ranê xwe bixwara?!

317

BILÎCAN

— Nêçîr her nêçîr e, çi virnî, çi qert.

— Bavo te baş kir, te ji me ra ev karmamiza nêçîr kir. Dest û çavên te neêşin!

— Ca bihêle em jî carekê goştê karmamiza Beriyê tam bikin, ma yê çi be!?

Eva Lokoyê begzade bû. Hemû bi vê gotina wî kenyan. Evdurehmanê

Terikî jî gotina wî rast derêxist û got:

Xudê Loku rast dibêje, bihêle ca em jî goştê karmamizan tam bikin û

bizandin kanê goşê wê şur e, şîrîn e, şîte, çawaye?

Vêca Evdurehman bi vê gotina xwe ra gazî Hasûxan û Pasûxani kir û

gote wan:

— Zûka dest hilînin, karmamizê biguron. Lê we ko gura, goştê wê hûr

nekin ha. Tenê zikê wê bidirînin. Ezê ji we ra biriyanekê çê bikim.

Vêca bixwe jî çû li nava barxanê beroş û tawûk û teşt û kevçî û kodik anî, danî rex kaniyê. Li çîwalekî da çend kodik sawar deranî û berda binê

berošê û danî rex kaniyê. Hindek Kakilê gîzê û findiq û berûyan û hin-

dek mewîj û qeysî li hebanan deranî û danî rex beroşa savarê. Hindek ard

jî deranî û hemû tev danî rex kaniyê û li kêleka kaniyê rûnişt û xerîkî şoştina savarê bû û pê ra jî dengekî gazî kir:

— Ca agirekî hil kin!

Neimetê Îsi fenanî caran, kuçik serast kir. Hevalan ew êzing û ardûyên

ko pêş da berev kiribû û li ser pişta hêştiran da anîbûn, bermil bermil anîn

û danîn ber destê Neimetê Îsi. Ta Neimeti agir hil kir, Hasûxan û Pasûxan karmamiz guran û zikê wê dirandin û hûr û pizûr û navgel hemû

ji hundurê zikê wê kaş kirin derva. Te digot qay cotek gurên derbuharêne

ko ketine ser kelaxekî û hildiçirin. Evdurehmanî hûr û pizûr da destê Loku û Elikî, ko li biniya kaniyê da bişon. Bixwe jî hindek av li ser cen-

dekê karmamizê da kir û karmamiz danî nava teştê û beroşa savarê kişande ber xwe. Savar û Kakil û mêywe hemû li nav hev da û heşande

hundur qefesa sîng û zikê karxezalê. Li dû ra destê xwe avîtê û li ber kolozê xwe da derziyeke takirî deranî. Zikê karmamizê li qefesa sîngi ra ta

navranan bi ser û ber dirû. Li dû durûna zikê karmamizê ra, gote Neimeti:

— Were alî min!

Neimet ko li ber agirî rûniştibû û alavên agirî du sê riman bilind bibû, rabû û çû alî Evdurehmanî. Tev bi cendekê karmamizê ra girtin û ew temisandin hundurê beroşê. Evdurehmanî kodikek av berda binê beroşê.

318 BILÎCAN

Pê hindek ard hevîrekî tund çêkir. Dorandorî devê beroşê hevîr kir.  
Sêl

rakir û danî ser devê beroşê. Hevîri beroş û sêl bi hev va zeliqand.  
Evdurehmanî du kevirên mezin jî danî ser sêlê. Vêca ewî û Neimeti  
alî

hev kirin û beroş rakirin û danîn ser kuçikî. Neimet jî mirovekî  
erknas

bû. Bêy wê hindê ko kesek bêjê, xwe da ber kuçiki û xerîkî  
agirxweşkir-

inê bû. Li qasekê da deng bi beroşê ket. Sêl wisan bi devê beroşê va  
zeliqîbû, ko pirtiya hulmê li devê beroşê ra dervediket.

Hevalan dil û hinav û hûr û pizûr şostin û anîn û danîn ber destên  
Evdurehmanî. Evdurehmanî du kuçên biçûk danî rex kuçikê mezin.

Dil

û hinav û dorandên şirîn û hûrik û şîlava karikê bi Hasûxan û Pasûxan  
da

hûr kirinê. Vêca hindek xoyê lê raşand û kire tawûkê û binê tawikê  
danî

ser wan herdu kuçên biçûk û rexê wê jî siparte beroşê û agir da bin  
tawûkê jî. Li demeke kurt da deng bi binê tawikê jî ket.

Kerr jî waye pala xwe daye kelmelan û hûrik hûrik dîna xwe dide  
destên

Evdurehmanî. Kulik jî waye li nava pêroyan digere û li qeyd û  
bendên

wan mêze dike. Kerrî gazî Lokoyî kir û gotê:

Loku ca were ta Evdurehmanî şîv amade kir, tu jî ji me ra miqamekî  
lê

de!



Bi gotina Kerrî ra, Lokoyî destê xwe li qerpalên xwe gerand û tûrikek  
li  
binê kûrika xwe ya paşelê deranî. Derê tûrikî vekir. Qotiyeye  
tenekeye  
zengorî ji tûrikî deranî. Derê qotiyê vekir. Neyîk û pîka wê ji qotiyê  
der-  
anî. Pîka neyîkê li ser neyîkê siwar kir û bi zimanê xwe dora pîkê ter  
kir.  
Du sê caran ba li ber neyîkê xist û neyîk amade kir û dest pê kir pêş  
da  
miqamê ax lê nûrê lêda. Dengê neyîka Lokoyî dikete zangê û li dilê  
deştê  
da deng vedida. Mirovî dikarî giştî gotin û peyvên wî miqamî li  
neyîka  
Lokoyî fam bike, ko digot:  
Ax lê Nûrê lê Nûrê  
Biçûkê gulî hûrê  
Tûmcik têla tembûrê  
Nûrê rûnişt ser bîrê  
Av kişande bi zincîrê  
Zincîr qetiya ket bîrê  
Li dû wî miqamî ra çend miqamên dî lêda û li pey miqamên dîlanê  
ra  
Lokoyî hey kire miqamekî mêranîyê. Lokoyî miqamê mêranîyê pir  
dirêj  
kir. Li dû ra pîka neyîkê ji devê xwe deranî û dora devê xwe pê destê  
xwe  
319

## BILÎCAN

paqij kir û dîsan neyîk naland. Vê carê miqamê kuştiyan lêda:

Nemînîm, nemînîm, nemînîm, nemînîm....

Axayo nemînîm! Bego nemînîm...

Piştî axa yê heşt hozan ra li ser rûyê vê cîhanê ez nemînîm...

Wezê ji kuştina axa yê xwe ra dilbikul û dilbirînîm...

Axayo nemînîm, bego nemînîm...nemînîm, nemînîm...

Dengê neyîka Lokoyî pir bi şewat bû. Bi taybet evî miqamî lap agir bi

dilê mirovî dixist. Gava ko Lokoyî li vî miqamî da. Hemû tev ponijîn. Bêdengiyeke sosret li ser wan da desthelatî kir. Li nîvê miqamî da Evdurehmanî got:

Kuro tawûk û beroşa me pê va şewitî. Ma miqam kuta bibû ko tu li vî

miqamî bidî. Te hindik mabû em hemû girî vekirana.

Bi dengê Evdurehmanî ra, dengê neyîkê hate vebirînê û her yekê tiştekan gotin.

Kerrî pirsî:

Loku tu çend miqaman dizanî?

— Ezbenî, nêzîkî çil, pêncî miqamên mêranyê dizanim.

— Lê miqamên dîlanê ?

— Pey... serê te ez bixwe jî nizanim, ka ez çend miqamên dîlanê dizan-

im lêdim. Qet min ta roja îro nehejmartiyê. Gelek in. Diqewime ji sed,

sed û pênciyî jî zêdetir bin.

— Ez dizanim helperkêya her miqamî ji yê dî cudaye. Wate her miqamek xudanê curek helperkê ye. Gelo tu bixwe jî dikarî bi van miqa-

man hemûyan bileyzî.

— A, a, bi hemûyê ez bixwe baş dikarim bileyzim. Lê li leyzê da Elik ji

min siviktir e. Malavayî gava ko dileyze, tu dibêjî piyên wî li erdê nagirin.

Hîvê xwe dabû naverasta asimanî. Sîbera zangê kuta bibû. Tavehîvê xwe dabû binê zangê jî. Her der ronahî bû. Neimet jî her li ber kuçike û

kûr diponije. Ta roja îro ewî nikarîbû tiştek bi Kerr û Kuliki bikira.

Nikarîbû erka xwe biqedanda. Destûrên xalê xwe hê mûyek jî cî bicî nekiribû. Kûr diponijî û qirş û qal davîte binê beroşê. Ta roja îro hê nekariye derbekê li Kerr û Kuliki bide. Dema ko li besta xîzê da, li wan

bû bagera xîzê, xwastibû, binê her çar meşkên avê jî kun bike. Lê paşê

hatibû bîrê, dê bixwe jî bi wan ra tîhna bimira. Lap eger her meşk kun

bikira jî, vaye giheştine ser kaniyê û ji buveya tîhnîtiyê rizgar bûne.

Li van

bîr û hizran da li ber agirî rabû û gote Hasûxani:

Ca xwe bide ber kuçikê ta ko ez hatim.

320 BILÎCAN

Hasûxan li batî wî xwe da ber agiri û ewî jî pêgermok gerand û berê xwe

da hevrazê pêsîra zangê û ber bi qûça zangê hilkişiya. Gava ko xwe  
da serê  
qûça zangê cinekî gotê, hema Kerr û Kuliki bi hevalan û pêroyan va,  
li  
binê zangê da bide ber pangewêran. Lê dîsan hate bîrê, ta ew  
pangewêrekî hol bike, tîra Kerrî dê dilê wî bihingêve jî. Li ser  
kevirekî  
rûnişt û mat ma li deştê nihêrî. Tavehîvê her der ronahî kiribû. Deşt  
bî-  
nanî bêjîngêkê pê va dihate xûyanê. Li binê deştê da, lap li kutaya  
deştê  
da, tiştekek bînanî gol yan kaniyekê diçilvilî. Avek bînanî neynûkê  
dibiriqî.  
Neimetî baş li wê avê hûr bû, dîna xwe dayê ew ava goleke ko  
sîtavkê dayê  
û ava wê, sîtavkê li ser zangê da spêne dike. Bi dîtina wê golavê ra  
nişkav-  
da tiştekek hate bîra wî. Şîreta Werdekê. Ya ko digot. Hûnê herin li  
besta  
xîzê, li qiracê daran, li ser gola Eynulhayê. Ava gola Eynulhayê  
geniye. Çi  
hespê ava wê golê vexwe, yê pê bimîne. Bi vê bîr û hizrê ra, li ser  
berê ko  
lê rûniştibû, rabû. Li ser kuçikî da zivirî. Xwe gîhande Evdurehmanî  
û  
hêdîka jê pirsî:  
Apê Evdurehman, tu bêjî em gihîştibin Qiracê daran?  
— Him... Erê da, meta Werdekê digot, piştî xîzistanê û kevirê çeq-

maqan gola Eynulhayê û Qiracê dara ye. Em negiheştinê, lê me nêzîkî pê

kiriye.

— A, rêka me hindik maye.

— Erê, erê me rêka xwe kuta kiriye. Tu yê çî li rêkê bikî?.

— Em westiyan. Min got ka emê kînga bikaribin baş bêhna xwe veden.

— Tu ji bilî agirî tiştekekê nakî ko tu dibêjî ez westiyam.

Neimeti xwe kir kir û dîsan xwe da ber kuçikî. Lê golmanca binê deştê

li kûraniya çavên wî da dibiriqî. Serê xwe kire ber xwe û xerîkî qedandi-

na erka xwe bû.

Dengê qijeqijê mêj ve bû, ko bi binê beroşê ketibû. Evdurehmanî guçkên xwe da ser beroşê û got: Ava wê lap mirçiqiye. Êdî qirşikan nede

binî. Bila bi hemdê xwe sor be. Ta ko em dil û hinavan bixon, ewê sor

bibe jî. Vêca tawûka dil û hinavan li ser kuçikî hilda û danî erdê û gazî kir:

Werin! Werin, ava devê xwe birijînin, ta ko biriyana me amade bû.

Heval hemû li dora wî û tawika dil û hinavan berev bûn.

Evdurehmanî

her yekê pirtiyek dayê.

Evdurehmanî dîsan guçkê xwe da ser beroşê. Qijeqija beroşê bû. Bi dengê wê ra diyar bû ko ava wê lap mirçiqiye û biriyana li nava doni da

diqele. Evdurehmanî pîneyek da ber destên xwe û tenê beroşa  
biriyanê li

ber xwe va kir û li ser kuçiki danî erdê. Kerrî gotê:

321

BILÎCAN

Evdurehman ewî kellê karmamizê ji min ra bike binpolik.

Evdurehman gotê:

Ser çavan ezbenî! Vêca bi gotina xwe ra polên agirê daran la da û  
kellê

karmamizê li nava polên agirî da cî kir û tijî li ser xwelî û pol kir û  
kelle li

nav koziyê da veşart. Bêhna xuzûrekê li binê zangê da lev geriya.

Evdurehmanî pê pîne ew kevirên ko danîbû, ser sêla li ser devê  
beroşê,

rakir û dest avîte û sêla li ser devê beroşê hejand. Bi hejandina sêlê  
ra bû

fîşîna hulma dax li devê beroşê ra avîte derva. Paşî qasekê hulma  
beroşê

lap kişiya. Vêca Evdurehmanî sêl li ser beroşê hilanî. Hulmê xwe  
avîte

nav çavên wî. Serê xwe li ber hulmê revand. Bêhna biryan û sawarê  
belawî axaran bû. Bêhneke pir xweş lê dihat. Evdurehmanî teşt danî  
erdê

û beroş li ber xwe va kir û deverû vergerande nava teştê û pê pîne  
bi binê

beroşê ra girt û du sê caran hilteqiland. Cendekê karmamizê hema  
wisan

tûmetûm kete nava teştê. Evdurehmanî don û rûnê binê beroşê li ser cen-  
dekî da dapaland. Hemû li dora teştê biriyane berev bûn. Kerrî xencera  
xwe li ber piştê xwe kişand û li zikê karmamizê ra kir û li ser sîngê wê ra  
deranî. Zikê wê dirand û sawar û Kakil û mewîjên tê da tev rijande nava  
teştê û pê kimê xencera xwe raxiste nava teştê, da ko sar bibe. Sawara  
demgirtî bi hulmegulm bêhnek wekî bêhna firîkê genimî belayî axaran  
kir. Bêhna xweş e sawarê da serê hemûyê. Evdurehmanê Terikî dest avîte  
û ew tayê ko pê zikê karmamizê dirûbû, bi zorê ji nava qetê goştê sorbûyî  
kişande derê û her yekê jî du nanên sêlê danî ber û got:  
Hanê bixon! Lê piştî şeş heft rojên dî em û xwarebar dê destên biratiyê  
bidin hevdu.  
Kerrî serê xwe rakir û li nav çavên Kuliki nihêrî. Kuliki got:  
Xudê ji me û xwarebarê ra jî kerîme.  
Evdurehmanî got:  
Erê em ta bi hîviya kerîm û rehîman va bimînin, cebar û qeharê me ji  
holê rakin.  
Neimetî got:  
Ev Evdurehman ji bilî kifiriyên tişteke dî nizanê.

Êxoyî got:

Oh, Neimet çi mirovekî xudêtirse,lo!

Neimet li bersiva wî da got:

A, min xudêtirsî li ber te girtiye. Xudê heye tu li me hemûyê jî xudêtir-stirî.

Buxdoyî got: çî ye, Xudê xudêya we ye. Xudê çiyar dibîne bewrfê li ser

322 BILÎCAN

da dibarîne.

Bi vê gotina Buxdoyî ra ji bilî Nemetî hemû kenyan.

Kerrî çengê xwe li hêta karmamizê da çik kir û goşt û satar têkel kir û

parî tê da bada. Li dû Kerrî ra hemûyê hêrişî ser xwarekê kirin. Li ser xwarekê çi kesî nedixift. Her kes li xêr û bêra xwe da bû. Fişefişa wan bû

û parî li dû pariyan ra li devê xwe da lev digerandin û dadiqurtandin. Hemû pir birsî bibûn. Li qasekê da hestik rût kirin. Nanê sêlê li binê teştikê sûtin û binê teştê jî paqij kirin. Hestikên hêt û pîlên karmamizê

şkandin û mejî jê deranîn. Kerr rabû çû ser kuçiki û pê nikilê xencera xwe

pol û xwelî li ser kelle da alîkî. Kelle li nav polan deranî. Xencera xwe li

çavê karmamizê ra kir û ew hema wisan bi xweliyê va anî rex teştê şîvê.



Evdurehman kelle ji destê wî vegirt û du sê caran li erdê da û  
xweliya li  
ser da dakuta. Li dû ra pîneyek da ber destên xwe û hêdîka çermê  
kelleyî  
jê şiqitand û kelle hema wisan tûm danî ber Kerrî. Kerr herdu çavê  
wê de-  
ranî û nivê zimanê wê jî birî û ji xwe ra hilda. Yê mayî jî avîte nav  
destên  
hevalan û got:  
Han ev jî para we!  
Hevalan kelle ji destên hevdu revandin. Pirtiya goştî pê va nehêlan.  
Vêca qotê wê yê reqe rût jî danîn ser kevirê û pê mistan lê dan û  
şkandin  
û mejiyê wê deranîn û xwarin. Piştî xwarinê jev bela bûn û her yek  
li  
aliyekî da çûn. Her yek çûne ber pesêva kor û kendal û kevirê. Piştî  
hîn-  
ga hatin û pala xwe dane kelmelan û her yek li ciyekî da vezeziyan.  
Evdurehman û Hasûxan û Pasûxan jî aman tev şostin û berev kirin.  
Piştî şostina amanan, Kuliki selekî mezin danî ser devê kaniyê û ew  
delava ko Hasûxan wan çêkiribûn, kavi kir û ava wê berda. Bû  
xuşîna avê  
û li nava kevir û kuçikan da berjêr da, ber bi binê newalê şiqitî. Kuliki  
li  
ber xwe da got:  
Ev ava giran e. Tirsim pêro şev gelekî vexon û pê bimînin.  
Lê çi kesî bersiva Kuliki neda. Te digot qay Kulik xwe ji xwe ra  
diaxive.

Bayekî germ û tund dihat û bêneke nexweş weke bêhna golegeniyên di

gel xwe dianî û li binê zangê digerland. Elikî got.

Peko! Çi bêhneke tund e. Tu dibêjî me li ser golegeniyên req û beqan

daniye!

Bi bihîstina navê golegeniyên ra, Neimeti xwast wan li ser wê dozê bixarîne. Xeber guhest û serê xwe rakir û got:

Ca li hîvê binêrin, ka çawa direve. Tu dibêjî qay li dû ketine û yê wê ya

bigirin.

323

BILÎCAN

Êxoyî got:

Rastî jî tu dibêjî qay tajî û tûle li dû ketine û dê ewê nêçîr bikin.

Hemûyan serê xwe bilind kiribûn û li hîvê mêze dikirin. Hîvê dilezand.

Esman bînanî destmaleke armûşê şîn sayî bû. Şînekî vekirî û bêgerd.

Şevê yekê yan duyan bi gered nobedarî dikirin. Ta sibêdê hişiyar diman. Kuliki pirsî:

Şeva dî nobedarî gereda kê bû?

Hemûyê bi hev ra gotin:

Şeva dî Êxo û Elik nobedar bûn.

— Îşev gereda kê ye?

Kerrî berî hemûyê bersiv da:

Gereda min e. Hûn hemû bi dilniyayî razên. Piştî xwe vekin û velezin.

Kulik û Hasûxan û Pasûxan dîsan li nava pêroyan geriyan. Çokên hêştiran îşkeîşk girêdan. Lingên hesp û hêştiran baş qeyd û bend kirin. Tewil avîtin qeyd û bendên wan û her yek li goşeyekê da baş tewil dan û hatin rex hevalan û her yek li goşeyekê da ketin. Hewa pir germ bû.

Hewceyî vegirtina kon û xîvetê nibû. Lê pêşûyan kelên ji wan birîbûn.

Gava ko ba nehata, vizeviza vizik û pêşûyan bû, û bînanî seqan hêrişî wan dikirin.

Kerr rabû. Hindek ters û paseriyên nîveter danî ser kuçikî û got: Kuro mîratê pêşû û vizikan em peritandin. Bila dûkela van berde pêşûyan lo!

Lê çi kesî bersiva wî neda. Hemû xurmaş bibûn. Têr xwaribûn. Têr vexwaribûn. Hemûyan jî rêyeke dûr û dirêj pîvabûn û pir westiyabûn.

He di gavê da bû xurîna wan û xew ra çûn. Kerr li ser kuçiki rabû. Qasekê pêgermok gerand. Serekî çû nava pêroyan geriya. Dîna xwe da qeyd û bend û tewl û mix û sikeyên pêroyan. Hemû baş girêdayî bûn. Zivirî hat binê zangê bal hevalan. Ew jî îro pir westiyabû. Hecirî bû karmamizê be-laya wî û Sosikê dabûyê. Wisan şeqî bû ko nikarî xwe li ser xwe bigire.

Hema wisan servekirî xwe li ser taqa piştê li rex hevalan dirêj kir û  
mat ma  
li hîvê nihêrî. Heyv li panatiya esmanê bêbin da direvî. Te digot qay  
bi  
gotina Êxoyî, li dû ketibûn. Carê telteyek ewir dikete pêşiya wê. Lê  
telte  
ewrên hindik û biçûk û tenik bûn. Hîv li ser wan ra derbas dibû. Siya  
wan  
dikete erdê. Lê hîvê careke dî kimê xwe li bin wan ra derdîna û pêş  
da  
diçû.  
Şevê kar li Kerrî kir. Seha tenêbûnê lê dest da. Li dinyaya bîr û hizran  
da, xwe da zozanên Sîpanê Xelatê. Li çadira dayîka Macanê da di gel  
324 BILÎCAN

Perîşanê dest li milan bû. Kete kûraniya xewin û xiyal û deryaya  
ramûsanên da û hema wisan servekirî li cî da bû xurîna wî û ew jî  
xew ra  
çû.  
Neimeti jî qestîka xwe xew ra biribû. Serguhê wî li ser Kerrî bû. Gava  
ko xurîna Kerrî bihîst. Hêdîka çavên xwe vekir û li dev û dorên xwe  
ni-  
hêrî. Guçkên xwe baş dagirt. Hemû razabûn. Kes nedilivî. Hêdîka li  
cî  
rabû. Xwe xwar kir û lemelem ber bi pêroyan xişikî. Li dilê xwe da  
got.  
Eger bi min hesiyan jî, ezê bêjim, ez çûbûme destavê. Bi vê hizrê  
xwe

gîhande nava pêroyan. Li sikeya tewla Sosikê xebitî. Hindî zor da  
xwe  
nedikarî sike ji erdê deraniya. Li rêyeke dî geriya. Tewla Sosikê ji  
qeyda  
wê vekir. Li qeydê xebitî. Lê kir û nekir nedikarî qeyd vekira. Kuliki  
qey-  
da wê kilît kiribû. Dîna xwe dayê nikare qeydê veke, bi neçarî dehî  
Sosikê  
kir û ew ber bi avê ajot. Dîsan teletel zivirî û hat û li dewsa xwe ya  
pêş da  
xwe dirêj kir û xwe li mergerîvîtiyê da. Sosik jî cotkî radibû û ber bi  
kaniyê diçû. Sosikê îro kewşenên heft gundan lev dabû. Rast bû ko  
ewê  
karxezal westandibû. Lê bixwe jî ji fişîn ketibû. Pir westiyabû. Gelekî  
xûyî dabû. Av gelek ji leşê wê çûbû. Zor tîhnî bû. Giheşte ser kaniyê.  
Lê  
kanî bi selbendan hatibû nixabtin. Devê xwe li coka kaniyê da li avê  
gerand. Lê çi av nekete devê wê. Av nibû, çirav bû. Hemanê hindî  
lûlikê  
lûlehengekî av li ber kaniyê dikişiya. Kete dû ava cokê û di gel cokê  
berjêr  
bû. Li coka kaniyê da av dikete nav qetên kevir û kuçikan û berjêr  
di-  
herikî. Sosika tîhnî dest ji avê nekêşa û kete dû şureşura avê û li ser  
herdu  
destan banz da û berjêr dakete binê newalê û li ber çavên Neimetî  
wenda  
bû.

Bayê sibêdê hewa tevizî. Hevalan li ber sermayê kêlekên xwe guhestin.

Kulik jî li ser kêleka çepê qulubî ser kêleka rastê. Repetepek li ber guçkên

wî ket. Çavên xwe vekir. Dîna xwe dayê çî! Nijdî waye ketiye destkolê û

erdê destkol dike. Li dora tewla xwe ra tê û diçe. Kerr ketiye xewa şîrîn.

Sosik jî tune ye. Bi lez rabû ser xwe û xwe bi Kerrî ra gîhand û ew gijgi-

jand û lê qujiya:

Kero rabe! Rabe mala te kavi be! Ka Sosik? Sosikê tewil û bendên xwe

qetandiye û filitiye çûye. Rabe em li nava dijiminî li berî û berîstanê da

peya man. Rabe tu yê wiha herî Bilîcanê bînî?

Kerr veciniqî û got:

Te xêr e? Pehe! Mala te yê! Min got ka çî bûye? Sosik li her kêderê be,

emê herin bînin. Heh min xewneke çend xweş didît, te nehêla.

— Kuro malçolo tu li nava dijminan da peya maî. Dibêje min xewin

325

BILÎCAN

didît, te nehîşt.

Bi dengedenga Kerr û Kuliki ra heval hemû ji xew rabûn û çavên xwe miz dan û li dora xwe nihêrîn.

Kerrî got:

— Lê te çawa tewil û bendên wê girê dabûn!?

— Xudê min lap ser û ber girêdabûn.

— Lê te ser û ber girêdabû, ma Sosikê tewila xwe bi didanên xwe vekiriye.

— Xudê kem we diyar e dexes û neyar li nav me da hene. Kurmên darê  
ne ji darê be, riziyan darê çineye.

— Kuro tu jî radizêy erdên kaş, dibînî xewnên şaş. Dexesê çi! Sosik fil-  
itiye, emê herin û bigirin û bînin. Ma çi bûye. Tu jî hema her dem digerî  
sûcên xwe bikî stuyê yekî dî da. Te baş girê bida qet venedibû.  
Evdurehmanî got,:

De devojenî hevdu nebin. Rabin em lê bigerin ka kû da çûye.  
Kerr bi bawûşk ji cî rabû. Dûrbîna xwe da destên xwe û ber bi serê zangê hilkişiya. Heval jî her yek li aliyekî da belav bûn. Yên ko rêça lingên  
wê hildidan. Yên ko rêça qeyda wê hildidan. Hasûxanî gazî kir: Sosik hema bi qeyda xwe va çûye. Bi qeydê va nikare gelekî dûr here. He niha  
li van dev û doran e.  
Kerr çû lap hilkişiya ser serê qûça zangê û dûrbîn da ber çavên xwe û li  
her alî dûrbîn gerand. Dûrbîn li destî da, çavên xwe li ser deştê da vî alî  
wî alî kuskusand. Tavê taze li deştê dabû û deşt ronahî kiribû. Avek li

binê deştê da wekî neynûkê diçilvilî. Kerrî pileya dûrbînê serast kir  
û dûr-

bîn baş li ser wê avê gerand. Li qiraxa avê reşek wekî qijalkekê  
dihate

xûyanê. Kerrî dîsan pileya dûrbînê serast kir û li reşî hûr bû. Dîna  
xwe

dayê erê Sosik e, waye li lîla rex avê da çik bûye û nikare xwe ji lîlê  
derîne.

Destê xwe li çoka xwe da û got: Hey la ezî malkavilî hey. Xudê kem  
Sosik bi ava golegeniyê ketiye.

Bi lez li zangê da jor da hat û li dû hevalan ra kire gazî û got:

Neçin! Neçin! Min dît.

— Kanê li kêderêye?

— Waye li binê deştê li ser golê ye. Li lîlê da çik bûye û neşê ji lîlê  
derkeve.

Vêca bi gotina xwe ra, bi lez xwe bi Nijdiyî ra gîhand. Teng û berên  
wî

şidand. Lê siwar bû û Hasûxan avîte terkiya xwe û ber bi golê hajot.  
Kuliki taba xwe neanî. Ew jî li hespê Hasûxan siwar bû û Pasûxan  
avîte

326 BILÎCAN

terkiya xwe û da dû Kerrî. Kerr û Hasûxan taze peya dibûn ko Kuliki  
xwe

bi wan ra gîhand. Bêhna hillemarê ji golegeniyê dihat. Bêhnê dida  
qafê

mirovî. Sosik ta binzikê li heriyê da çik bibû. Her çar lingên wê ta  
bersîng



û saxiriyân şîşî lîqê bibû. Kerr û Kuliki alî hev kirin û kelbendek  
çêkirin  
û avîtin skura Sosikê û bi hezar û yek kul û derdan şiyân ko Sosikê ji  
heriyê derînin. Sosikê hind av vexwaribû, ko zikê wê bibû meşk û  
hindik  
dima bigihîje erdê. Sosikê bi zorê piyên xwe davît. Tav sê çar rîman  
bilind  
bibû ko Sosikê gîhandin binê zangê. Şîn li ser wan da hatibû.  
Hemû li vê hizrê da bûn ko Kerê li binê berî û berîsatane da, li nava  
di-  
jminî da, li herafê meydanê da li çî siwar bibe.  
Neimetê Îs ji bona kurmamê xwe xûn digiriya. Kerr li ber geriya û  
gotê:  
Kuro tu çîma digirî? Ma tu mêr nînî!? Mêr nagirîn. Bergîreke yê çî  
bibe. Emê hespeke dinê peyda bikin.  
Lê Kerrî dizanî li wê beriyê da, li welatê dûr û nenas û namo da, yê  
li  
kêderê bikaribe mahîneke weke Sosikê peyda bike. Eva çendik û  
çend sal  
in, ko ew û Sosik li ser xû û xideyên hevdu ketibûn. Sosik mahîna wî  
ya  
destemo ye. He dikarî şevê li Sosikê siwar biba û biçûya bêy deng  
û se-  
da Bilîcan hilda û bianiya. Lê niha yê çî bikira. Hemûyê dizanîn ko  
Sosik  
êdî kêrî meydana şerî nayê. Hemûyan destên xwe li ber hev ra  
kiribûn û  
li ser hevdu da diponijîn.

Buxdoyî got:

Rabin hûn çima diponijin! Hindek xwaliya kaxçîn û hindek mewîj ji min ra bînin. Avê lê girtiye. Ezê wisan wê ya qenc bikim ko wekî roja berê bê ser hemdê xwe.

Pasûxan banz da li rex kendalê biniya kaniyê torbeyek xwaliya kaxçîn

hanî. Evdurehmanê Terikî jî li nava barxanê torbeyek mewîj anî.

Buxdoyi ew mewîj û xwaliya tevî hev kir û li ber tavê raxist. Piştî demeke

xurt xwelî barewayî bû. Buxdoyî ew xwelî û mewîjane kire cihurekî û

kişande serê Sosikê û got:

Ta şeş rojan avê û gîhê li Sosikê bibirin. Bila her çi ava genî ko vexwariye, ji nava wê here.

Bi gotina Buxdoyi ra hemûyan zanîn ko ta şeş rojan divê li ser wê kaniyê bimînin. Hevalan dest pê kirin û kon û xîvetê xwe li rex hev li se

kaniyê vegirtin.

Roja yekê cuhur her wisan tijî li serê Sosikê da bû. Lê li roja duyê da Sosik hêdî hêdî likijî. Ewê bi lêvên xwe mewîjên li nava xwaliyê da dibi-

jart û dixwar. Buxdoyi jî rojê carekî ew cuhurê wê diguhest û destek

327

BILÎCAN

mewîj û xwliya taze lê zêde dikir. Li roja çaran da Sosik lûlexanî bû û bêh-

neke pir genî li ser ket.

Buxdo hat û li ber rawesta û got:

— Her çî gend û gild û gemar hebû, hemû rokire derva, êdî ji mirinê filitî.

Du rojên dî jî wisan xewlî û mewîj dane Sosikê. Rojê satilek av ji bin Sosikê dikişiya. Roja şeşan Sosik lap baş hate ser hemdê xwe. Buxdo fer-

man da Hasûxan û Pasûxanî û gote wan:

— Pêşiya vê avê bixendiqîn.

Hasûxan û Pasûxan çend kevir û çîm danîne pêşiya ava kaniyê. Av çî-

rav çirav li pişt çîm û keviran da berev bû û golmanceke biçûk serast kir.

Buxdoyî li ber xwe da got:

— Pêşiya çî baş gotine: çirav çirav dibe gol.

Li dû ra milên xwe veda û got:

— Ji mira kevirekî xoyê û tasekê bînin.

Jê ra kevirekî xoyê û tasek anîn. Hasûxan av li ser destên wî da kir û ewî

jî bi kevirê xoyê Sosik şal kir. Li dema şal kirina Sosikê da, destê Buxdoyî

li ser çîp û saxiriyên Sosikê li çend donbelan ket. Gava ko lê hûr bû, dît

ko çend qelemên hêştiran li saxirî û çîpên Sosikê da çik bûne û kêm û

edab girtin û bûne donbel. Xwe li Hasûxan û Pasûxan tûre kir û got:

— Lê we ta niha çawa Sosik tûmar dikir ko we ev qelemana li saxiriyên

wê da nedîtine.

Hasûxan û Pasûxan xwe kir kirin. Çi bersiva wan tunebû. Bi dengê Buxdoyî ra Kulik jî hate lalî wan û li saxiriyên Sosikê nihêrî. Teşk û eşkên

Sosikê li ber stirîn û qeleman girêgirêyî bibûn. Kuliki berê xwe li ser Kerrî

da kir û gotê:

Han evana jî yadîgarê te û serjêkirina kudikêye. Dayîka Werdek gote te

Sosikê li dû kudikan nevêje nava qeleman, te bi gora wê nekir. Hanê ev

jî akama negudariya te.

Li wê navê da Buxdoyî lingê Sosikê yê paşiyê rakir û lê mêze kir û got:

Kerr lê te qet nedigot, vaye nalekî Sosikê jî ketiye. Keviran lê daye simên wê jî hincî hincî kiriye.

Kerrî pirsî:

— Nalê wê ketiye?

Kulik bi tûretî lê zivirand: Erê pehlewan! Ew jî yadîgara nêçîra kara xezalê ye. Te baş şîretên Werdekê kire guçkên xwe da. Îca tu yê bi vê

Sosika nivîşkan herî Bilîcanê bi şer û lêdan bînî!

328 BILÎCAN

Kerrî Got:

Çi nake lo! Buxdoyê nihe nal bike:

Buxdoyî pêş da pê kimê gûzanê û serê derziyê ew dirik û qelemên ko li

saxirî û teşkên Sosikê da mabûn, yekoyeko deranî. Donbelên dewsa wan  
guvaşt û kê m û edaba tê da paqij kir. Li dû ra gazî Êxoyî kir û kelmelên  
xwe yên nalbendiyê xwast:  
Êxoyî xurcika kelmelên nalbendiyê Buxdoyî ji nava kelmelan deranî û  
hanî danî ber destên wî. Hasûxan bi serê Sosikê ra girt û Pasûxan jî lingê  
Sosikê yê bênal bilind kir. Buxdoyî simteraş hilanî û bû fîtefîta wî û pêş  
da simê Sosikê yê hincî hincî bûyî baş û bi ser û ber taraşt û li ber xwe da  
ev gotina pêşyan vegêra:  
Ji milkan aş.  
Ji pîşeyan simteraş.  
Ji mêran, mêrên beropaş.  
Ji mêran, mêrên beropaş.  
Ji mêran, mêrên beropaş.  
He ev hevoka kutayê li ber xwe da çendpate dikir û simên Sosikê diter-  
aş. Li dû ra nalek ji xurcika nalbendiyê deranî û danî ser simê Sosikê. Nal  
hindekî mezin bû. Ew nala danî û nalekî dî hilanî. Nal li ser simê Sosikê  
da ediland. Nal durust beranberî simê wê bû. Vêca li dû ra mixek ji de-

boyê mixan hilanî û danî ser kuna nalî û bi çekûçan lê ba ket. Li dû  
ra  
mixekî dî û mixekî dî jî. Ta ko her şeş mix jî li simê Sosikê da û serên  
mix-  
an li ser rûyê simê Sosikê ra hilavîtin. Vêca simê Sosikê danî ser  
kotikekî  
û serê mixan li nîviyê da birî û deverû li ser simî da qet kir û mix  
yekoyeko  
li simê Sosikê da şidand.

Kulik jî li ser serê wî ra rawesta ye û li destên wî û çawaniya nalkirina  
Sosikê dinihêre. Gava ko Buxdoyî mix li simê Sosikê da dikuta, Kuliki  
bi

dilekî şewat got:

— Buxdo tu Xudê bi hemmet, tu Sosikê dixî mixan.

Buxdoyi gotê :

— Ma ez taze nalbendiyê dikim, tu min şîret dikî!

— Na, na mebesta min ew nibû. Dilê min bi rewşa Sosikê dişewite.

— Ne, ne lap dilniya be. Çi hesp ta roja îro li ber destên min neketine  
mixan, ta ko ez îro Sosikê jî têxim mixan.

Gava ko nalkirina Sosikê kuta bû, Buxdoyî gote Hasûxani:

— Ca Sosikê fenanî caran zîn bike kanê!

Îca li dû ra jî gazî Kerrî kir û gotê:

329

BILÎCAN

— Kerr were li Sosikê siwar be, serekî dûyan li ber çavên min ra  
bibeziîne kanê rewşa wê çawaye.

Ta Kerrî xwe berev kir, Hasûxani Sosik zîn kir jî. Kerr hat û li pêş çavên hemûyê li Sosikê siwar bû. Sosikê li bin siwarê xwe da ser û dêlên xwe berev kir. Kerrî du sê seriyên ew li pêş çavên Buxdo û dîtir hevalan ra bezand. Buxdo yî gazî kirê:  
— Bes e! Bes e! Sosikê ta du sê rojên dî lap bê ser rewşa xwe ya pêşîn.  
Hespên ko ez derman bikim, êş di bedena wan da namîne. Lê te Sosik pir wesrandiye.  
Bi gotinên Buxdo yî ra hemû tev şa bûn. Wê şevê jî li ser kaniya kevirê Çeqmaqan man.  
330 BILÎCAN

41

Koça kurên Werdekê daliqiyayî daliqiyayî li ber gola Eynulhayê ra derbas bû. Li ser milê çepê da zivirîn. Berê wan kete çiyayên bi xilxile. Êdî çol û çolistan li dû xwe ra hêlan e. Dar û deven tekoteko li vira û dera hanê li ber çavan dikevin. Hindî ko ber bi wî çiyayî diçin, hind diçe, li hejmara dar û deven û alaşan zêde û zêdetir dibe. Deven berebere bilind

û bilindtir dibin û dibin dar. Berebere li hejmara daran jî zêde û zêdetir  
dibe û dar û bar hev digirin û dibin bişî û cengel.  
Li nava xilxile û xîstorên reş ra derbas bûn û giheştin çiyayekî asê.  
Rê li  
qontara wî çiyayî ra, li rex çemekî ra derbas dibû. Rê nibû,  
korerêyeke zi-  
rav û asê bû. Ajelek bi zorê dikarî tê ra derbas biba. Binê rê geliyekî  
teng  
û kûr bû. Hurşêna çemekî boş bû, ko li wî geliyî ra derbas dibû.  
Eger kesek li wê rêkê ra derbas bibe, nawêre li bin xwe ra li avê û li  
gelî  
binihêre. Pêlên avê kef li ser ketî vî alî, wî alî serên xwe li kendal û  
kevir û  
tat û zinarên lêvara teng didin û li nav hevdu da dişkên û paş da  
dizivirin.  
Tu dibêjî qay li ber serhişkî û heybeta lêvarê paşekişê dikin. Pêlek  
diçe û  
pêla dî cîhê wê digire û xuşîn li binê geliyî tê. Li ser serê mirovî ra jî  
dîwarekî bilindî kevirîne. Dîwarek ji zinarekî yekparçe û bilind. Eger  
mirov serê xwe bilin bike û rast lê binêre, kumê mirovî dê li serê  
mirovî  
bikeve. Ji vira ra çepa cerdan dibêjin. Eger lingê mirovekî li ber  
bişimite,  
yan pêroyek bilukume, yê durust li binê geliyî da, li nava avê da cûm  
bibe  
û di gel pêlên har û dîne avê berjêr here û li nava kûraniya çemî da  
bezir



bibe. Lê dîsan jî tişteke baş e ko li hindek ciyan da, li binê rê da qurmedar

û qolên devenan hene. Eger ew kesê ko li wî geliyê da ketiye, mêrekî ki-

rarî û bi dil û gurçik be, jîr û jêhatî û zîx û çeleng be, bikaribe destên xwe

li qurma darekî va, li rîşala devenekî va bend bike û ewê li destên xwe

bialîne, ta ko hawariya hevalên wî pê ra gihîşt û werîsek, kindirek, ke-

mendek jor da daxstin û ew pê va helpasî û bi dest û lepan, lê bi ser û

guhên xûnavî, bi hezar û yek kul û derdî li ser ket û li devê mirinê rizgar

bû. Taze eger ew mirova mirovekî leşgiran be, qurm û rîşala dar û deve-

nan, dê bi destên wî va bimîne û ewê xwe li binê geliyê da, li nava 331

BILÎCAN

kûraniya avê da bibîne. Yan jî eger bext ji wî ra bibe yar û destên wî li

rîşaleke çir û bitew asê bû û rîşalê taba giraniya leşê wî anî, lê werîs û

kindir û kemendan taba wî neanîn, ewê li wê bilindayê da bikeve nava

kûraniya avê û bibe xwarê masî û kûsî û nihengên binê avê.

Çepa cerdan, çepeke pir asê û teng û buvedare. Mirov ko ji çepê û  
li bin  
zinarê bilind ra derbas dibe jî, dîsan berê mirovî dikeve ser  
hevrazekî  
bilind. Ta niha ewê çepê giyanê gelean jê standiye û ewan kiriye  
xwarê  
masî û kûsiyan. Ta roja îro her pişkeke wê çepê navek lê kirine: Çepa  
cer-  
dan, çepa mirinê, xendeqa guran, hevrazê fistiq, çepa xertelan û  
çendîn  
navên dî.  
Li ser serê wî zinarê ko raserî korerêyê da bejin veda ye, cure cure  
dar û  
deven û gwînê lev aliyane. Şîlaneke bi gevde û levaliyayî durust li ser  
qûça  
wî zinarî bejin veda ye. Li bin sîbera wê şîlanê da cotek xertelên  
milrût  
hêlûn danîne. Ca eger rêya kesekî li bin wê dara şîlanê bigire, dê  
rastî hes-  
tûdaneke mezin bê. Hestûyên her cure ajelan, hestikên karxezalan,  
yên  
kar û berxan yên masiyan, yên maran, heylo hestikên mirovan jî li  
ber  
hêlûna xertelan li ser hev da bûne qûç. Car û bar jî libek, du lib  
hestik li  
wê bilindayê li nava hestikên li ber hêlûna xertelan dikevin serê rê  
û bal-

ayî dev û dorê rê dibin. Her çend ko xelk li bara wê hestûdankê da gelek tiştan dibêjin, lê ta roja îro ji bilî balinde û firindeyan rêya çi giyanliberî, piyên çi kesî li ser serê wî zinarî neketiye. Mirov ko kûşkê li ser serhevrazê biniya zinarî, ko dibêjinê hevrazê fis-tiq, dikeve, berê mirovî dikeve geliyê kûr. Rê li binê geliyê da pêş da diçe. Vî alî, wî alî geliyê, ta ko digîje bilindaya çiyên jî, daran mil kutane hev. Darên cur be cure cengelî, yên weke: bîh, melhem, çûk, darpirtûk, kevot, kezvan, kaj, çekem, dêlqantirok, evrisî û darên mêweyên cengelî yên weke: givîş, korosk, sêv, şîlan, zerîşk, hiloçik û tûvereşkan lev aliyane û pêş da çûne. Hindî ko mirov hevraz, ber bi serê gelî diçe, hind diçe dar bilind û bilindtir û çir û riximtir dibin. Koça kurên Werdekê bi kul û halekî ji çepa mirinê rizgar bûn. Li ser serhevrazê fistiq ketin û jor da ber bi milê rastê şiqitîn û geliyê bi dar û bar li milê wan yê çepê ma. Erd berdelan û xîştor bû. Rê digel avê û li ser dîwarê avê ra berjêr diçû. Li binê geliyê da, hêdî hêdî dîmen dihate guhorînê. Hindî ko mirov berjêr diçû, çiya û çem ji hevdu dûr diketin.

Çiya û çem hêdî hêdî ji hevdu diqetiyân û çem ber bi deşteke vekirî  
pêş  
da dişûlikî. Dora çemî darên bîh û sipîndaran mil kutabûn hev. Li  
nava  
qetên darên bîhê ra qol qolî dirîreşk û tûvereşk û li cî ciyan da jî  
dêlqan-  
332 BILÎCAN

tirok li ber çavan diketin. Hindî çem ji çiya dûr diket, hind diçû, ji  
hej-  
mara daran kêr dibû. Bere bere cegen û qamûşistanê ciyê dar û  
baran di-  
girt û erdê xîştor ciyê xwe dida pêrge û nermanê.  
Dîsan weke çendik û çend caran rê li vira jî bû du rêyan. Koça kurên  
Werdekê dîsan li ser duriyanê rawestan. Li panavkekê da barên  
pêroyan  
li ser piştta wan hildan û pêro bi hev va girêdan û berdane nav wan  
çî-  
menên dora cegenê û bixwe jî berê xwe dane nav rêl û bişiyân û  
xerîkî  
berv kirina mêweyên cengelî bûn. Evdurehmanê Terikî hat û li ber  
Kerrî rawesta û gotê:  
— Xwarebara me hema bi zorê têra îro û sibê bike û neke. Çareyekê  
bike.  
Kerrî bersiv da:  
— Me va xwe daye devê çepa cerdan. Ê... belkû tişteke li ser me da  
hat.

Sî dadigeriya. Tavê pencên xwe kutabû serê girên pêşber û hêdî  
hêdî

dixwast biqulibe ko dengê zengilê stuyê hêştirên rêvîng û  
bazirganan

Kerr li kûraniya bîr û hizrên aloz da deranî.

Kerr ko li ser berekî rûniştibû, rabû ser xwe û gazî hevalan kir:  
Hevalno

zû werin vira!

Bi dengê Kerrî ra heval hemû li dora wî berev bûn û pirsîn:

— Çî ye?

— Zû hespan zîn bikin, ta ko karwan ji çepê derneketiye. Xudê wê ji  
me ra gîhand. Ez û Kulik emê herin pêşiya wî karwanî. Hûn jî xwe  
bidin

wê berwara fêza çepa fistiqî û pangewêran holî pêşî û paşiya  
karwanî

bikin. Lê agadar bin, ko pangevêrên we li me negirin. Hûn me  
dikujin

ha.

Kuliki gotê:

— Bira were dest ji van karana bikêşe. Ne te digot ez diziyê nakim.

Kerr keniya û got:

— Kuro diziya çî. Em vaye eşkere davêjin ser karwanî.

— Ca ew jî her dizî ye.

— Kulik em vaye birsîna dimirin. Tu dibêjî em li birsîna bimirin û dest  
li ber xwe bikêşin, ko çî ye me gotiye em diziyê nakin. Kuro xwe tev  
girêdin! Bila Kulik bi me ra neyê. Kulik tu xwe bide ber hêştiran, ta  
ko

em hatin.

Hevalan hemûyê gotinên Kerrî rast derêxistin. Kulik jî gava dîna xwe dayê Kerr serwext nabe û li ser da sivikatiyê jî pê dike, neçar ma, ewî jî

xwe tev girêda. Kerr û Kuliki pêro û hêştir bi hêviya Hasûxan û Pasûxan

333

BILÎCAN

va hêlan û dîsan li wê rêya ko tê ra hatibûn, bi hevalên xwe va hev ra

dadane çepa mirinê. Li bêhnekê da serhevrazê geliyê kuta kirin û giheştin

hevrazê Fêza çepa Cerdan. Li nêzîkiya çepê bûne du desteyan. Desteyek

çûne fêza rê û desta dî, xwe dane devê rê.

karwan giheşte çepa mirinê û li dû hev rêz bûn. Kerrî destê xwe da ber

çavên xwe û karwanî û pêroyên wan hejmart û gote Kuliki:

Sî hêştir û sê hesp û deh mêr in. Hemû jî çekdar in.

Kuliki got:

— Bihêle bila hindekî dî jî paşiya karwanî ji çepê derkeve paşê.

Rawestan da ko ser û binê karwanî li çepa biniya zinarî derketin û berê

wan kete serhevrazê fistiqi. Kerr û Kuliki her yekê xwe dane aliyekî rê û li

pesêva kevirekî da kemîn girtin û bi hev ra li karwaniyan qûriyan:

— Lo lo li nav pêroyan derkevin!

Li nav karwaniyan dengê bilind bû:

Lo lo hûn kêne? Li serê riya me derkevin, dena ezê we kunkunî bikim.

Kerrî bersiv da:

— Kuro lawo gelekî lafan neke! Nebe hegera kuştina xwe û hevalên xwe. Gelî karwaniyan serê pêroyan berdîn û li nav pêroyan derkevin!

— Em serê pêroyan çî carî bernadin. Li serê rêya me derkevin.

— Xudê kem, hûn bernedin, emê cergên we kunkunî bikin. Kerrî bi vê gotina xwe ra tîrek avîte hespê pêşiyê. Bû hîrehîra hespî û şeh rabû û

da zîtikan û xwe hilavît û li erdê ket û hol bû û li ser dîwarê kendalê xen-

deqa guran da jor da totolo bû û kete nava çemî û li qaseke kurt da cen-

dekê wî li ser avê ket.. Kerr bi tîreke dî hespê paşîn jî li ser çokan xist. Li

dû ra bû virevira pangewêran û li ser paşî û pêşiya karwanî da barî. Karwaniyan xwe bezir kirin. Ele pele bûn. Yekê ji wan tîrek avîte Kerrî.

Tîr li ber lingê Kerrî li erdê girt. Kerrî baş nîşan girt û tîrek li peleka wî da

çand. Bû zarezar û ofeofa wî.

Kerrî gote wan:

— Xudê kem hûn li nava pêroyan dernekevin, emê we hemûyê li xen-

deqa guran da jor da hol kin.

Karwaniyan dîna xwe danê her sê aliyên wan jî hatiye girtinê.

Bintara

wan jî xendeqa Gura ye. Çi rê tune ye. He rastî jî eger teslîm nebin,  
vaye  
ewî pêşîn her bi tîran dê wan yekoyeko bihingêve. Hemîn  
pangewêran jî  
rewşa wan pir aloz kiriye. Pêşengê karwanî ko mêrekî çil, pêncî salî  
bû,  
gazî kir:  
Kuro lawo hûn û Xudê me nekujin, ka hûn çî dixwazin em bidine we.  
334 BILÎCAN

Kerrî gotê:

— Min her cara pêşîn gote we, li nava pêroyan derkevin û giyanê  
xwe

rizgar bikin.

— Bavo me nekujin bihêlin em ji nav pêroyan derkevin. Gor bavê  
we

û Mîrê Ereban. Lê evê jî bizanibin, hûn herin ber perê esmani jî, hûn  
ji

destê Mîrê Ereban nafilitin.

Kerrî jê pirsî:

— Eva karwana yê kî ye?

Gotin:

— Eva karê zemawenda Kulîlka nebiya Mîre.

Gava ko navê Kulîlkê hat, tişteke germ li nav dilê Kuliki ra derbas bû.  
Zarotiya wî û Kulîlkê û zemawenda wan û malkmalkoya wan hate  
bîrê.

Kerrî li wan heyband û got:

— Li nava pêroyan derkevin! Ev karê zemawenda min e, ne ya



Kulîlkêye. Bila Mîrê Ereban karekî dî ji nebiya xwe ra bike. Dey, dey  
zû  
li nav pêroyan derkevin.  
Karwaniyan stuyê xwe xwar kirin û li nava pêroyan derketin û hatin  
li  
ber Kerr û Kuliki ra derbas bûn. Deh mêrên bi rû û bi simbêl. Bi şûr  
û  
rim û tîr û kevan va.  
Kerrî tîrek danî ser jeha kevanî û li wan heyvand:  
— Çekên xwe jî danên erdê!  
Karwaniyan bi neçarî çek û rextên xwe ji xwe şiqitandin û dane milê  
rê  
û ji pêroyan dûr ketin. Li ser hevrazî ketin û li berjêrê geliyî da şûlkîn.  
Duduyan xwe dabûne bin milê hevalê xwe yê birîndar û berjêr da  
bînanî  
bayê bezê direvîn. Ker, siwarî da ser wan û kemenda xwe avêt û yek  
ji nav  
wan da kire gîrê û kemend lê şidand. Kemend li nava wî aliya û ew  
li ser  
serî li erdê da. Kerrî kemend kaş kir û ew li ser xwe da kişand. Yê  
mayî  
hevalên xwe hîştin û seriyo tu qurbana nigan bî. Panî li pê dan û  
herin ko  
hûn naçin. Ewê ko ketibû gîra Kerrî gencekî qorî tazegiheştî bû. Kire  
girî  
û ah û zarî û xwe avîte ser dest û piyên Kerrî û bi girî li ber Kerrî  
digeriya  
û digotê:

— Xalo tu û Xudê tu min nekuje! Ez bi destgîran im. Tu û Xudê tu mi-  
razê min li çavên min da nehêle! Tu û pîr û pêxemberan tu min berde ez herim.

Kerrî pê kenîya û gotê:

— Na na lawo tu çi ditirsî. Netirse , ez te nakujim. Tu çendê hejî giyanê xwe dikî!

335

BILÎCAN

Kulik hate cem Kerrî û lê pirsî:

— Te ev çima girt?

— Jê vegere! Karê min pê heye.

Kerrî herdu destên peyakê dîl girêda û da pêşîya xwe.

Hevalan jî hesp û hêştirên pûrê dane pêşîya xwe û anîn serê duriyanê.

Kerrî li hevalan heyband û got:

— Kuro hêştirên me jî bar bikin!

Hevalan dest pê kirin û hêştirên xwe jî bar kirin û li hêviya fermana Kerrî rawestan.

Kerrî ji peyakê dîl pirsî:

— Bêje kanê ev herdu rêyana ko da diçin?

Peyaki stuyê xwe xwar kir û li rêyan nihêrî û got:

— Ev şiverêya ko ber bi çiya diçe, ew rêka koçeran e. Ew li Qîracê daran

ra ber bi warkozan û Şargên Lewendan diçe. Ew panerêya han jî ber bi

beriyê diçe.

Kerrî lê pirsî:

— Kes niha li warkozan maye, yan na?

— Na kes êdî li warkozan nemaye. Tenê herdu mehên buharê yê sere-

tayê koçer li warkozan dimînin.

— Êla Eliyê Siwaran niha li kêderê daniye?

— Êla Eliyê Siwaran niha li wî alî çemî daniye.

Li dû van pirsiyaran ra Kerrî çavên peyakî girê da. Li dû ra dest û piyên

wî jî girêda û ew wekî pezekê avîte terkiya Sosikê. Bû zarezara peyakî û

got:

— Xalo tu û Xudê tu min nekuje!

Kerrî xwe lê tûre kir û gotê:

— Lawo min carekê ji te ra got. Mêr dîlên xwe nakujin.

Hevala bi fermana Kerrî qentera hêştiran bi hev va girêdan û berê qen-

tera giran dane şiverêya koçeran û li Qîracê Daran ra ber bi Şargên Lewendan hilkişiyên. Tarî ketibû erdê ko li nava dar û baran ra derbas

bûn û xwe gîhandin panavkek biçûk ko li nîveka bişiyekî çirî rixtim da

ketibû. Her sê aliyên panavkê zinarên bilind weke kelayeke destkir mil

kutabûn hevdu.

Bi fermana Kerrî hêştir li hundurê wê kelaya suruştî da hîş kirin.

Kerrî

peyakê dîl ji terkiya Sosikê vekir. Herdu destên wî û herdu piyên wî  
qeyd  
kir û serê qeydê avîte zincîrekê û zincîr jî avîte darekê û peyak hema  
wisan  
girêdayî li kêleka xwe da rûniştandinê. Hevalan jî barên hêştiran  
vekirin.

### 336 BILÎCAN

Serê mişk û maran ji baran kêmbûn. Li mêwe, hişkebar, çerez, şîrînî  
û  
şekirokan bigire, ta zêr, zîv, navmalî, kulavên Xurestanî, mafûrên  
Îranî,  
xişl û rihel, parçeyên giranbuha, xavikên armûşe rengareng, şalên  
rîs û so-  
lik û kondereyan li nav baran da hebûn. Derê çîwalekî mewûj û  
leblebiyan vekirin û lê baketin. Wê şevê xwarê wan bû şîrînî û  
şekirok û  
mêwe û çerezên cur be cur.  
Taze tavê lê da bû ko Kerr û Kulik siwar bûn. Kerrî dîsan dest û piyên  
peyaki girêda û ew avîte terkiya xwe û gote hevalan:  
Hûn li vir bin, ta ko em hatin. Herdu bira ji hevalan qetiyên û berê  
hes-  
pan dane nava bişî. Li nava bişî derketin û ketin serberjêrê Qîracê  
daran.  
Serberjêrê kuta kirin û daketin deştê û li nav saz û qamûşistanê ra  
derbas  
bûn. Qamûş û cegen lev aliyabû û seranserî deştê dabûne ber xwe.  
Nijdî ser û dêlên xwe kiribû yek. Siwarê xwe li nava dêl û bijiyan da

wenda kiribû. Lê Sosik ne wekî her care. Hemêşe Sosikê pêşî ji Nijdî di-  
stand. Lê niha nawe ketiye nîveka wê û Nijdî da. Nijdî ew para va hêlaye.  
Sosik êdî ne ew Sosika berêye. Ser û dêlên xwe wekî her car nagire.  
Kulik  
evê yekê dibîne û dikevgire. Dizgîna Nijdiyî hildikşîne. Gema wî berev  
dike, ta ko Sosik bê û li wî derbas bibe. Kerr jî mêj ve ye ko bi vê hindê  
hesiyaye, lê li ser xwe va nahîne. Tev giheştin li ber çemê boşî panî berîn.  
Lemelema çemiye. Tu dibêjî qay çem li cî da rawestaye. Nalîve. Kerr  
û  
Kulik li vî rexê çemî rawestabûn, rexê dî bi zorê bi wan va dihate xûyanê.  
Ta ko mirovî tiştekan neavîta ser rûyê avê, mirovî nizanî av li kî da diçe.  
Kerr û Kulik li nava cegen li rex çemî ji hespan peya bûn. Peyak ji terkiya  
Sosikê vekirin. Dest û pê û çavên wê jî vekirin. Peyakî çavên xwe miz da  
û li dora xwe nihêrî û tirsetirs pirsî:  
— Hûnê li vira min bikujin.  
Kerr kenîya û gotê:  
Min carekî ji te ra got, em dîlên xwe nakujin. Lê tu ya rast ji me ra nebêjî, emê a, li vê derê serê ta parava lêdin.  
Peyak elepele bû û got:

— Xalo yezdan kem, ezê ya rast ji we ra bêjim. Ka hûn çî dipirsin ez ji

we ra bêjim.

Kerrî gotê:

— Tu bihurê vî çemî nas dikî?

— Erê xalo ez nas dikim.

Kerrî jê pirsî:

— Êla Eliyê Siwaran niha li kû daniye?

337

BILÎCAN

Peyakî bi hejyareya destê xwe ew girên wî alî çemi, ko deh danzde mey-

danan dûrî çemî bûn, nîşanî wan da û got:

— Êla Eliyê Siwaran niha li rasta pişt wan girên hanê da daniye.

Kuliki jê pirsî:

Lê mala zarên Hesê Dûdêyî li kû danîne?

Ewan jî niha li girê kolotan, li rex ava zirav danîne.

Kerrî dîsan dest û piyên peyakî qeyd kir. Çavên wî girêda û ew bi tewla

Sosikê li nava qamûşan da bend kir û gotê:

— Li vira be ta ko em hatin. Lê ji cî nelive ha.

Peyak giriya û got:

— Xalo ne te got ezê te berdim.

Kerrî xwe lê tûre kir û gotê:

— Min carekê gote te ko ez te nakujim. Lawo tu çî xortekî bihecokî!

Peyakî xwe kir kir.

Kerr û Kulik siwar bûn û peyak li nava cegenî da tenê ma. Kuliki ji

Kerrî pirsî:

— Tu yê çi bikî?

— Were em axarnasiyê bikin. Sibê me avîte ser mala Mîrî û me Bilîcan

anî, bêgotin dê li dû me bikevin. Were em li van axarana bigerin û bi başî

binasin. Bila çavên hespên me jî bikeve ser van kor û kendal û qamûş û

cegen û hezekana.

Tev dest pê kirin, serekî duyan li nava sazên li dora çemî da geriyan.

Li

rex çemî ketin û li buhurê çemî nihêrîn. Lê vî alî wî çemî cegen û çirpî û

dirîreşk lev aliyabûn. Tenê li ciyekî da, ew jî li vî destê çemî rêya hat û

çûya pêroyan dihate xûyanê. Lê rê ne rêyeke taze bû. Li ax û giyayê li dev

û dora çemî ra bi zorê diyar dikir, ko midehekî berî niha rê li wur ra der-

bas bûye. Lê ew aliyê çemî yê dî bi wan va nedihate xûyanê. Li nava qamûşan derketin û hesp xistin wan ber û bestana û du sê seriyan jî li wan

ber û bestên fêza qamûşistanê dane xaranan. Li dû ra hatin bal peyaki.

Peyak ji cîhê xwe neliviya bû. Lê gava ko hesp gihîştin ser, ji cî hilqedimî

û got:

— Xalo hûn hatin?

Kerrî gotê :

— Erê em hatin.

Vêca Kerr û Kulik bi hev ra ji hespan peya bûn. Kuliki dest û pê û çavên peyakî vekir.

Kerrî ji peyakî pirsî:

338 BILÎCAN

— Te got ko tu buhurê vî çemî nas dikî?

— Erê xalo, ez nas dikim.

— De nîşanî me jî bide, kanê kê der bihur e?

Peyak tirse tirs li dora xwe nihêrî û li rex çemî ket. Kerr û Kuliki jî serên

hespên xwe ra girtine û dane dû wî. Takû peyak bi ciyekî, ko mirovî he-

manê dizanî, demanekî rêyek li wur ra derbas bûye, gihîşt û got:

— A, ev dera bihurê vî çemî ye. Êl û karwanî hemû li vira ra derbas dib-

in.

— Tu yê bikaribî, ji vî bihurî ra derbas bibî.

Bû îske îska peyaki û pirsî:

— Xalo hûnê min berdin?

Kerrî gotê:

— Here, me tu aza kirî.

Peyaki bawer nedikir. Rawestabû û li nava çavên Kerrî dinihêrî. Kerrî xwe lê pert kir û gotê:

— De here, tu aza yî!

Peyak bi tirs ji wan qetiya. Xwe li avê da. Avê da navtenga wî. Bi



somekarî xwe gîhande nîveka çemî. Av du sê caran li ser serê wî ra qulubî.

Lê peyak somekaerkî baş bû. Bi dest û pêyan somekarî kir û xwe gîhande

wî alî çemî. Gava ko li nava çemî derdiket, zivirî dîsan li pişt xwe ra mêze

kir. Li dû ra beziya. Kerr û Kulik pê kenyan. Peyak li wî alî çemî bi zorê

bi Kerr û Kuliki va dihate xûyanê, ko herdu bira li hespên xwe siwar bûn

û ber bi Qîracê daran zivirîn.

Herdu birayan serê hespan şil kiribûn û bi guj dajotin. Fîrefîra Sosikê bû. Sosik, Sosika caran nibû. Zikê wê mezin û saxiriyên wê lawaz û sku-

ra wê ziravtir bibû. Gelek ciyan jî lingên wê li hev dialiyan. Kulik bazorê

serê Nijdiyî radigirt, ko li pêş wê nekeve. Lê her dem Nijdî li pêşiyê bû.

Kulik li bîr û hizran da bû. Li dilê xwe da got: Xudê kem Sosik êdî ne hes-

pa meyedana şerî ye. Ez çawa bikim ko Kerrî serwext kem, ko dest ji

Sosikê bikişîne. Li van bîr û hizran da bû ko giheştin şoveke mezin.

Ser û

binê şovê bi hev va nedihate xûyanê. Ava aşekî li fêza şovê ra derbas dibû.

Diyar bû ko şov pê kotanê kêlabûn. Şov û paşov kiribûn û ji çandinê ra

amade kiribûn. Yê van rojan ew biçandana û bikiran pence.  
Gava ko Kerr û Kulik giheştin fêza şovê, teştê kete serê Kuliki. Kulik  
serê Nijdiyî berev kir û xwe li dû ra girt û gazî Kerrî kir:

— Kerr ca nejo kanê!

Kerrî jî dizgîna Sosikê ragirt û pirsî:

339

BILÎCAN

— Te xêre!?

— Min xêre.

Vêca xwe li hespê da avîte erdê û got:

— Ca tu dizgîna Nijdiyî ra bigire!

Vêca dizgîna Nijdiyî da destê Kerrî û xwe bi coka avê ra gîhand.

Pêşiya

avê xendiqand û ava cewê li se şovê da şkand. Kerr bi zendeman jê  
pirsî:

— Kuro Kulik tu yê çî bikî?!

— Peya be, ez ji te ra bêjim, kanê ezê çî bikim.

Kerr bêy hemdê xwe ji hespa xwe peya bû.

Bû xurpexurpa avê û li ser şovê ket. Şovê av hilçinî. Her çend ko av  
aveke boş bû, lê dîsan jî qaseke xurt kişand, ta ko av ji vî serî giheşte  
serê

dî. Av li şova ripe rast geriya. Şov bû deriya. Deriyayek li av û qurê.

Her

du bira rawestabûn û li şovê û xurpexurpa avê dinihêrîn.

Kerrî serê xwe hejand û pirsî: kuro ca bêje ka tu yê çî bikî, paşê. Ez  
çî

sederiyê ji vî karê te nakim.

Kuliki jê pirsî:

— Ker, ez û tu birane yan na?

— Erê em birane.

— Em herdu kurên Silêman û Werdekêne, yan na?

Kerrî bi zendeman got:

— A!

— Sosik û Nijdî herdu jî caniyên mahîna Barxanene, yan na?

— A, herdu jî caniyên mahîna Barxanene.

— Were ez û tu emê berêkanê bikin û hespên xwe biezminin.

Pêroya

kê ji şovê derket û xwe bi hişkatiyê ra gîhand, ewî lê biriye. Lê pêroya kê

jî derneket, bizane ew pêroya yê li meydana şerî da jî dernekeve.

Ca der-

manê wê ser lêdane. Emê serê wê lêdin.

Kerrî gotê: were em herin, niha hevalên me li hîviya me mane. Me taze

karwanê xelkê şelandiye, niha xudanê karwanê dê li dû malê xwe ra bên.

Kuliki gotê:

— Hevalan neke berhane. Her ez jî li wê hizrê da me. Niha hawariya êla Mîrê Ereban li dû me ra bên. He yê li binê hevrazê Qîracê daran da

bigîjin me. Sosik êdî ne ew Sosika carane.

Kerrî xwe lê tûre kir û gotê:

— Tu çi dibêjî? Çawa Sosik, Sosika caran nîne! Siwar be em herin.

Derenge lo!

Kuliki gotê:

— Tu nawêrî bi min ra berêkanê bikî, bêje ez nawêrim. Ca tu bo berhaneyan digirî?

Kerrî dîna xwe dayê, ne herê, Kulik dest jê nakêşe. Bi neçarî got:

— De were em hespên xwe biezminin. Herdu li hespan siwar bûn.

Li

rê derketin. Li ser cowê ra banz dan û xwe dane ber serê şovê. Li ser ben-

ga şovê herduyan serên hespên xwe dane ber hev û bi hev ra hajotin nava

şovê. Bû çirteçirta qurê û li ber guçkên siwaran ra derbas bû. Hesp ta fêza

kaban diketin heriyê û li heriyê da çik dibûn. Nijdî axa hişk li binê heriya

şovê ra derdixst û li ser milê Kuliki ra davît. Lê Sosikê her bi zorê lingên

xwe li heriyê da derdixist. Lê dîsan her dûyan cot herî diqelaştin û pêş da

diçûn. Cotkî banz didan. Xwe davîtin, dîsan di heriyê da çik dibûn û dîsan xwe li heriyê derdixistin û dîsan cûmî heriyê dibûn. Siwaran

hesp

dane ber zengî û tajankan. Hespan kêrûşkî qewş dikirin. Ha Sosik ha, ha

Nijdî ha. Ta nîviya şovê herdu hesp cot, li ber hev û bi hev ra diçûn.

Lê ji

nîviyê ko derbas bûn, serê Nijdiyî li ber guçkên Sosikê ra bihurî. Hêdî

hêdî serê Sosikê hate ser qefesa Nijdiyî. Şerp û terp û qîrçe qîrça  
tajankan

û helkehelka siwaran û fîrefîra hespan bû. Tajank bûn ko li hewa ba  
dibûn û li ser saxiriyên hespan da peya dibûn. Berebere dêla Nijdiyî  
li serê

Sosikê derbas bû. Êdî devê Sosikê nedigihîşte dêla Nijdiyî. Hêdî hêdî  
nawe kete nîveka wan. Gezek du gez, sê gez, deh gez. Nijdî xwe bi  
wî serê

şovê, xwe bi hişkatiyê ra gîhand. Bû fîrefîra wî. Lê Sosik li heriyê da  
ma.

Bû firtefirta lingên wê. Ta lingekî xwe li heriyê da dideranî, lingê wî  
yê dî

li heriyê da çik dibû. Kulik li Nijdiyî peya bû û ew vî alî û wî alî li dû  
xwe

destkêş kir. Kerr jî waye Sosikê dide ber tajankan. Du sê gez mabûn,  
ko

Sosik şovê kuta bike, binzika wê hindik mabû bigihîştê ser heriya  
şovê.

He bi kul û halan li nava heriyê derket. Bi derketinê ra, Kuliki şûrê  
xwe

kişand û rikêfî ser Sosikê kir. Kerrê lê heyband û bi zenda wî ra girtr  
û

gotê:

— Kuro tu dîn bûyî çawa?!

Kuliki got:

— Ev mercê meye. Bihêle ez serê wê bifirînim. Xudê ewê me li nava  
di-

jminî da şepirze bike. Ew bi ava golegeniyar maye. Êdî ew kêrî  
meydana  
şerî nayê. Ta ko ew me dide kuştinê, bihêle ez serê wê lêdim û bila  
li ber  
çavên me negere. Ezê Nijdî bideme te û ezê ji xwe ra hespekî dî  
peyda  
bikim.

Kerr tûre bû û Kulik palda û bi zorê şûr li nava destê wî deranî.  
Kuliki bînfişk vedida û digot:

341

BILÎCAN

— Kuro bihêle! Xudê kem ewê me li nava dost û dijminan da rûreş  
bike. Bihêle em ewê li ber çavên xwe ra kin.

— Kuro tu li ser hemdê xwe nînî?! Çawa destê te diçe Sosikê? Çawa  
de-

vê te digere tu dibêjî ezê serê Sosikê lêdem!? Evê heriyê fil jî nikare  
biqelişîne. Tu dîna xwe nede Nijdiyî. Nijdî ji Sosikê biçûktir e. Leşê  
wî

sivik e. Sosik giran e. Bi gevdeye. Lingên wê erdê hişk diqelişîne, îca  
tu

dibêjî bila li şova avdayî da jî çik nebe?!

Kuliki bi tûreyî lê zivirand:

— Xudê Sosik ji te ra nebû hesp qet, ewê te şepirze jî bike.

— Rabe, em siwar bin! Kanê heval çî dîkin. Tav waye hate qamê  
nîvro.

Herdu li hespan siwar bûn û berê hespan, dane Şarigê Lewendan.

Hesp

ta fêza kaban li heriyê da mabûn. Heriyê xwe dabû binzika Sosikê.  
Teng

û berên wê hemû bibûn herî. Li hevrazê Qîracê daran da Nijdî bînanî  
cûncikekê fir dida û nawe dida Sosikê. Lê Kuliki li ber Kerrî bi zorê  
dizgî-

na wî berev dikir û xwe para va digirt. Her çawa bû Kerr birayê wî  
yê

mezin bû. Rast bû herdu hevalcêvî bûn, lê Kerrî berî wî çav li cîhanê  
vekiribû. Birayê mezin dihate hejmarê. Li ber vê hindê li ser deb û  
resmên komelayetiyê Kuliki her dem rêz ji Kerrî ra digirt. Û çî caran  
nedixwast dilê wî ji xwe bihêle.

Taze li şovê dûr diketin, ko siwarekî cilinboz, siwarê hespekî qimer,  
li

wan derbas bû. Kulik li ser milê xwe da zivirî û li siwari nihêrî. Lê  
Kerrî

serê xwe kiribû nava dêl û bijiyên Sosikê û dajot. Kulik xwe pê ra  
gîhand

û gotê:

Kerr ew siwarê hanê rengê xelkê zozanan dide.

Kerr jî li ser milê xwe da zivirî û lê nihêrî û got:

— Xelkê zozanan li vira çî dike. De bi me çî. Kê dibe bilanê. Tev ser-  
hevrazê Qîracê daran kuta kirin û giheştin nav hevalan. Hasûxan û  
Pasûxan qentera hêştiran bi hev va girêda bûn û xwe dabûne ber.  
Evdurehmanê Terikî û Neimetê Îsi jî weke caran xwe dabûn ber  
kuçiki

û karê xwerekê dikirin. Loku û Elik û Buxdo û Êxo jî ketibûn nava  
daran

mêweyên beyanî berev dikirin. Bi hatina Kerr û Kuliki ra hemû li dora

wan berev bûn.

Buxdoyî pirsî:

— Hûn li sibê da, li kêderê bûn? We çi kir?

Kerrî bersiv da:

— Me çû bihurê çemî peyda kir. Emê du sê rojên dî xwe li çemî bidin.

Dema hemûyê saz bû. Hemûyê digotin û dikeniyên. Tenê Kulik di bîr

342 BILÎCAN

û hizrên kûr da bû.

Şev li ser wan da hat. Li nava bişiyê dora kelaya suruştî da her yek li goşeyekê ketibûn. Kerrî qêr kirê:

Delalê dilê min ji dilanî dîn e...

Xezalê dilê min ji dilanî dîn e...

Vê şevê dilê minê çi dilan li ser xwe ra nahebîne...

Çawa kesekê xudanî xêran wê çunîne...

Silavekê ji beriya Şengarê bi zozanên Sîpanî Xelatê ra bigehîne...

Bêje delalîka ber vî dilî, bila li nava xem û kederan da qet nemîne...

Demanê min û anîna Bilîcanê kêr dimîn e...

Delalê dilê min ji dilanî dîne...

Dengê Kerrî dikete kevîran û zingîn jê dihat. Her çend ko stirana Kerrî

stiraneke evîndariyê bû, lê li ser teqla stiranên şîn û şîngêriyê da hate



gotin. Kerrî bixwe jî nizanî kanê çima teqla stirana wî wisan bi şewat hat.

Kulik jî waye pala xwe daye cihêzên Kulîlkê û kûr diponije. Eva çendik

û çend şeveroj in, ko rê tèn. Çendîn êl û zome û gund û bajar li pişt serê

xwe ra hêlane. Hindî rê dikudînin û pêş da diçin, hemû her Kurdistan e.

Hemû kurd in. Lê hemû jî dijmin û neyarên hevin. Her zome û êl û her

gund û bajarekê serok û sergêrekî xweyî serbixwe heye. Lê ev serok û

sergêran jî tim dijî hevin. Yek serê xwe ji yê dî ra xwar nake. Dilê yekê ji

yê dî ra naxwaze. Hemû çavnebariya hev dikin. Hemû ji dil û can cigir û

neyarên hevdun e. Hindî hatine hema li rê da rastî kuştin û şerên hoz û

tîreyan bûne. Rastî dizî û talankişandin û şer û gêre û xûn û xûnrêştinê

hatine. Hindî hatine her rastî şerên xwe bi xwetiye hatine. Her Kurd in

ko hevdu dikujin. Li her ko danîne rastî cerd û diz û talankêş û reşedizan

hatine. Bixwe jî vaye diçin diziyê. Vaye cihêzê bûkan şêlandin e. Vaye

diçin ser Kurdan şerî. Bixw zehlê wî ji xwe û Kerrî çû. Her çi dibêje Kerrî

, Kerr li bersiva wî da dibêje tu tirsênok î. Tu newêrekî. Tu dola Silêmanî

nînî. Tu kurê Werdekê nînî. Tu ne nebiyê Silîv beg û Hesê Dûdêyî. Li dilê xwe da got:

Ez nizanim li ber çavên wî kî diz û cerdewan û mêrkuj be, ew mêrxas e.

Xew li çavên Kuliki nediket. Li dû peydakirina çareyekê bû, ko belkî birayê xwe serwext bike. Lê dizanî ya bûyînê nîne.

Şev li nîviyê jî derbas bibû, lê hê xew li çavên Kuliki neketibû. Lê Kerr her bi stirana xwe ra, xew ra çû û xurexura wî bû. Hasûxan û Pasûxan jî

nobedar bûn. Her yekê xwe dabûne layekî Şarga Lewenda û pêgermok

digerandin. Kulik jî rabû çû bal wan û pêkve agirek dadan. Bi dadana

343

BILÎCAN

agirî ra hevalên wan yê dî jî yekoyeko rabûn û li dora agiri berev bûn.

Buxdoyî got:

— Pêşiya çî baş gotine, kes li ber agirê gur nareve.

Ta nêzîkiya sibêdê ardû li agirî zêde kirin û li ber ronaya agirî rûniştin û xeber dan, hê seyra sibêdê ser nedabû ko Kerrî kêleka xwe guhest û

bawîşk hatinê û ew jî hat û li rex agirî rûnişt.

344 BILÎCAN

Danê nîvro bû ko peyakê dîl bi helkehelk û şelpetelp xwe bi dîwana Mîr

Elî Siwaranî ra gîhand û ji Mîrî ra got; cerdê xwe daye Şargên Lewendan.

Hejmara wan û zaraveyên wan jî ji Mîrî ra şirove kir. Bi hatina peyakî ra

Mîrî fermana duhola hawarê da. Bi dengê duhola hawarê ra ji her alî si-

war û peya ber bi mala Mîrî kişyan. Lê ta siwar û peya li ser hev da berev

bûn, siwarekî cilinboz li ber derê mala Mîrî da peya bû. Siwari li ber qetê

kulozê xwe da nameyeke nivîştî deranî û da destê Mîrî. Mîr pêça namê

vekir û çavên xwe lê kuskusand û carekê name li serî ta bini xwend û

careke dî jî bi ser û ber lê hûr bû. Li dû xwendina namê ra peyakê cilin-

boz tek kir û jê pirsî:

»Te ji kesî ra negotiye, ka tu ji kê derê têy?«

— Na min ji çi kesî ra negotiye.

Li dû wê hindê ra ko Mîr lap dilniya bû, peyakî çi tişt ji çi kesî ra negotiye, ferman da:

— Lezê nekin! Em bi cîhê wan û hejmara wan baş hesiyane. Niha qet

çi kes bila li dû cerdê nekeve, ta ko cerd lap dilniya dibe, ko hawarî li dû

wan ra naçe.

Li dû fermana Mîrî ra siwar û peyayan jev berdane û her kes ber bi mala

xwe zivirî.

Roja îniyê bû. Tav rimekê bilind bibû. Ew du roj bûn ko Kerr û Kulik karê zemawenda Kulîlkê şêlandibûn, lê çî kes li dû ra nehatibû. Evê hindê lap Kerrî nerehet fikir. Xwe ji xwe ra digot, kuro ma qet mêrek li

nava êla wî da tunebû ko li dû me biketa. Evan çî mirovên bê xîret û

neçîne. Bi van hizrana va rabû û gazî Hasûxani kir û gotê:

— Hasûxan ca ji min ra Sosikê zîn bike!«

Bixwe jî cil û bergên pehlewaniyê ji xwe bêxist û destek cilkên derwêşan li xwe kir. Şûr û xencera xwe li bin da girêda û deplikek derwêşan

da destê xwe û gote hevalan :

— Ezê herim serekî li nava êlê bigerim û tişteke bizanim û bêm.

Li dû ra bixwe jî destek li teng û berên Sosikê gerand. Hasûxani zengiya

345

BILÎCAN

wî dagirt û ew li Sosikê siwar bû û xatirê xwe ji hevalan xwest û li nava bişî

û daran ra ji Şargên Lewendan derket û li Qîracê daran da jorda daket û

ber bi deştê û qamûşistanê hajot. Li Qîracê daran ra deşt wekî neynûkê

pê va dihate xûyanê. Deşteke ripe rast. Çemekî boşî giran li ser sîngê

deştê da çivane dida xwe û ber bi dilê deştê dişûlikî. Vî alî, wî alî  
çemî  
qamûş û cegen lev aliyabûn. Tavê lêdabû. Çem li ber rewneqa tavê  
diçil-  
vilî. Kerrî yekbîn ta ber lêvara çemî hajot. Hate rex bihuri. Zengî li  
Sosikê  
da û Sosikê xwe li avê xist. Avê da zengiya Kerrî. Kerrî Sosik zengî  
kir.  
Sosik pêş da çû. Avê da ser zînî. Sosikê somekarî kir. Sosik weke  
werdekekê li ser avê ket û bi somekarî xwe gîhande wî alê çemî.  
Kerr li  
Sosikê peya bû. He li ber lêva çemî cilkên xwe bêxist û givaşt. Te  
digot  
qay li ber kuçikê Werdekê rûniştiye. Bîstekî xwe da ber pesêva  
Sosikê, ta  
ko cilkên wî her koşkê barevayî bûn. Dîsan zû cilkên xwe li xwe kir  
û xwe  
xiste rengê derwêşan û deplika xwe da ser destê xwe û ber bi êla  
Mîrê  
Ereban hajot. Girikekî angorî zemîn bilind li pêşberî wî bû. Hajote  
ser  
serê girikî. Li pişt girikî da deşteke pan û berîn bû. Hindî çavan didît,  
deşt  
bû û hindî deştê pêva qeter dikir, kon û xîvet bûn ko mil kutabûn  
hev û  
pêş da diçûn. Çavên mirovî li ber kon û xîvetan reş va dihat. Kerrî  
dûrbî-

na xwe li xurcika xwe deranî. Dûrbîn da ber çavên xwe. Li bestê nihêrî.

Kî alî mêze dikir, reşkon û xîvet bûn. Qîz û bûk deste deste ji kon û xîve-

tan derdiketin û ji vî konî diçûne konê dî. Jin û zar li ber derê konan di-

hatin û diçûn. Dûrbîna xwe li perê êlê gerand. Dîna xwe dayê konekî reşî

erebî li perê konan vegirtine. Ne serê koni diyare, ne binê konî. Li ber lê-

va xwe da got:

— Divê ev ko mala Mîrê Ereban be.

Dîsan dûrbîn li dev û dorê konan gerand. Li wî alî deştê aveke zirav bî-

nanî çirka şîrî li ber tavê diteyîsî û dihat û tevî çemê mezin dibû. Wî alî

wê ava zirav bizerê karî reşên şeş, heft konan li hev derxe. Dîsan li ber lê-

va xwe da got: evana jî gereke konên xalên me bin. Dîsan dûrbîn li ser

konê Mîrê Ereban gerand. Dîna xwe dayê bînanî tiştê ko xêr û şerek hebe, şêvrek hebe, mêvandariyek hebe, deste deste mêr li wî konî derdikevin û deste deste diçînê. Dûrbîn li dor û berê konî gerand.

Dor û

berê konî hera û hêvirze bû. Dîsan dûrbîn vî alî wî alî li ser deştê û zomê

gerand. Dîna xwe dayê li biniya malan da şeş, heft kesan hespek dane nav

hev da û ber jêr dibin. Dûrbîn baş li ser wan gerand. Dît, ko waye yek wê

pêroyê destkêş dike û yên dî jî li dû ra diçin.

Dûrbîn dîsan li ser wan gerand. Dîna xwe dayê waye ew pêroya dire-

346 BILÎCAN

qise û orxe dibe. Ser û dêlên xwe dike yek. Bû tikîna dilê Kerrî. Tişteki li

nava dilê wî da qetiya. Xwe ji xwe ra got:

— Bi gorina babo, her ev Bilîcan bixwe ye.

Berê Sosikê da biniya malan û bi bayê bezê ber bi wan hajot. Nizanî ew

naweya çawa kuta kir. Xwe gîhande wan. Dîna xwe dayê mahîneke şîn-

boz e. Yekê bi hefsarê wê ra girtiye û yên dî jî li peyê tîn. Baş li mahîne

hûr bû. Dîna xwe dayê çawa ko dayîka wî û peyakê dîl ji wan ra salix dane, xaleke sipî li ser gurçika wê ya çepê ye. Waye ji bo avdanê ber bi bîrê

dikişînin. Kerr bi wan ra gihîşt û destê xwe ji wan ra bilind kir û gote wan:

— Ji we ra wîşt!

Hemûyan bi hev ra bersiva wîştê Kerrî dan:

— Wîştê te li ser wîştê be, day û bavê te li bihîştê be!

Kerrî pirsî:

— Pirsiyar bêxewş e, ew çawa hêstire ko hûn weha pê ra şa dibin.

We

qet hêstir nedîtine çawa?

Hemû bi Kerrî kenîyan û yekê gotê:

— Kuro lawo ma tu korî, ko tu hesp û hêstiran ji hevdu nas nakî.

Lawo

ev Bilîcana Mîrê Erebane. Lawo ev mahîna li dewsa xeracê heft salên

Erebistanê va hatiye. Tu çi diaxivî?! Dibêjî qay tu ne xelkê vî welatîyî!»

Kerrî gotê:

— Xalo bibexşîne. Min nas nekir. Min got qay hêstir e.

Vêca bi gotina xwe ra ber bi wan çû. Gava ko gihîşte wan ne ji gav da

şûrê xwe li ber xwe kişand û hêrişî ser wan kir. Şûrek li tera skura destkêşkirê Bilîcanê da lêda. Hefsarê mahîne ji destê wî derket.

Kerrî

rikêf kir û hefsarê Bilîcanê ra girt. Ê hêrişî ser wanên dî kir. Gava çavên

wan bi xwîne ketin, her yek li aliyekê da revîn. Kerrî zengî li Sosikê da û

Bilîcan kire êrdeka xwe û ber bi Şargên Lewendan hajot. Ta peyakan hawarî ji dîwana Mîr Elî Siwaranî ra gîhandin, Kerrî xwe gîhande avê û

ji çemî derbas bû jî.

Kulik derketibû raserî girê Şargên Lewendan û dûrbîn dabû ber çavên

xwe û li deştê dinihêrî. Gava ko çavên wî li deştê da bi siwarekî ket, ko



hespek jî li dû xwe ra kiriye êrdekê, dûrbîn li ser ranekir. Ta ko baş nasî û

dît ko Kerr vaye tê, Bilîcan jî kiriye êrdeka xwe. Mizgînî da hevalan û got:

— Kuro Kerr vaye hat û Bilîcan jî îna.

Hemû bi mizgîniya Kuliki ra şa bûn û ber bi girê Şargên Lewendan revîn. Ta heval gihîştin serê gir û ji hevdu pirsîn ka li kû ye, Kerrî xwe bi

wan ra gîhand jî. Hemû helatin pêşiya Kerrî. Kulik xwar bû erd maç kir

347

BILÎCAN

û hindek xwalî avîte devê xwe. Kerrî xwe lê pert kir û gotê:

— Çi bûye tu erdê maç dikî û xweliyê davêjî devê xwe!

Kuliki gotê:

— Ê, bira sipas ji Xudê ra, ko te çû Bilîcan bêşer û bê kuştin anî. Tu bixwe jî tendurust zivirî. Lê ezê hê erdê maç nekim!

— Ne herê, birayê te ta ko li vê derê şerekî danenê, naçe. Sibê Emer Axayê bêje, te çû mahîna Bilîcan dizî anî. Bira mercê me û Emer Axayî

ew e ko em Bilîcanê jê ra bi şer û lêdan, bi zora darê dar rimê bînin, ne ko

bidizin. Bihêle hê gelek maye.

Vêca bi van gotinane ra berê xwe li ser hevalan da kir û got:

— Yek ji we bila biçe xwe bide serê girê han û nobedariyê bike, ta ko

me karê xwe kir. Emê li Qîracê daran şerekî danên paşê.»

Neimetê Îsi berî hemûyan got:

— Ezê nobedariyê bikim.

Vêca bi gotina xwe ra rima xwe û dûrbîna xwe hilda û wekî kûselekî ber

bi girê Şargê Lewendan hilkişiya.

Kulik li ber Kerrî geriya û gotê:

— Bira were wan kevirên li pêşa xwe bavêje! Te Mahîna Bilîcan înaye,

êdî kuta bû. Mercê te li cî ye. Ma Emer Axayê zorê li me bike. Were em

bar bikin û herin.«

Taze qudetiyê li Kerrî dest daye. Qet li ser xwe ra çî kesî mêr nahejmêre. Xwe li Kuliki tûre kir û gotê:

— Kulik tu yê bihêlî em bizanibin ka em li ser çine û li ber çine, yan na?! Here alî Hasûxan û Pasûxanî. Kerr tûre tûre dizgîna Sosikê da destê

Hasûxan û bixwe jî qeyd li lingê Bilîcanê xist û kilîda qeydê kire berîka

xwe û gote Hasûxan û Pasûxanî:

— Werin xwe bidin ber Bilîcanê. Mûyek ji leşê wê şaş be, ezê serê we

lêdim.

Kulik li ser stirînan bû. Dîsan hat û li ber Kerrî geriya:

— Bira were ji kerê decalî peya be. Me karê zemawenda wan jî pûr kir,

li dû me ra nehatin. Te çûye bêy şer û bêy xwînreştin Bilîcan înaye, dîsan

vaye kes li dû te ra nehat. Were em her niha da bar bikin û li ber çavên

wan nist bibin û herin. Tu çima dibê hegerê xwînreştinê? Tu çi dizanî ka

çiyê biqewime?

Kerr ji heleqê derket. Tûre bû û xwe li Kuliki hêrs kir û gotê:

— Kuro tu çi bicîyî? He li serê serî da dilê te nedixwest, tu bi min ra

bihatay. Mercê me û mêrikî ew e ko em Bilîcanê jê ra bi zora darê dar

348 BILÎCAN

rimê bînin. Niha me Bilîcan diziye. Kulik ez mêrê diziyê nîninm. Ta ez

li vira şerekî nedanêm, ez li vira naçim.

Hindî Kuliki gelegî got, Kerrî hindik bihîst.

Neimetê Îs jî xwe daye serê giriki û diro da dûrbîn daye ber çavên xwe

û vî alî wî alî dinihêre û Xudê Xudêya wî ye ko hawarî bi wan ra bigihîje.

Ewî her li niha da karê revê kiriye. Li dilê xwe da dibêje:

— Eger siwar hatin, ez nabêjim van. Dema ko siwar bi vana ra gihîştin,

ezê herim xwe li nava qetên daran da veşêrim û guçkên xwe bidim ser

hawarî û gaziyan.

Hevalên dî hemû li dora Kerrî berev bûne û karê şerî dikin. Şûrên xwe

girêdidin. Rim û mertalên xwe diezmînin. Hasûxan jî xwe daye ber Bilîcanê û li dorê ra bûye turik. Geh tûmar dike û geh pê ra şa dibe. Sî dageriya. Lê çî deng û seda ji êla Mîrê Ereban çê nebû. Şev pê ra gi-

hîşt û dîsan jî çî deng û seda ji wan çê nebû. Kes li dû Bilîcanê ra nehat.

Evê hindê lap Kerr nerehet dikir. Şevê perda qîrê kişande ser Qîracê daran û Şargên Lewendan jî, dîsan kesek li dû Bilîcanê ra nehat. Bayekî

nerm divizandê û mişîn dikete nava bişî û rêlan. Hemûyê guçkên xwe li

ser hawariyê da dagirtibûn. Lê çî deng û seda çê nebû. Te digot qay çî tişt

li êla Mîrê Erebanî neqewimiye. Kerrî li ber kerban didanên xwe distîrikandin û simbêlê xwe dicût.

Kulik jî li dilê xwe da şa dibe ko hawarî li dû wan neketiye û belku sibê

xwe bi mala xalanên xwe ra bigehîne û wan bi her tiştî bihesîne. Kulik li

nava pêroyan digere. Li Bilîcanê mêze dike. Bilîcan tu dibêjî kareke xeza-

la ye. Navtenga wê zirav û saxiriyên wê tijî û pêsîra wê vekirî û bi xiştênê ra serê xwe bilind û guçkên xwe mûç dike. Li Sosikê dinihêre.

Sosik weke pezeke gêj lê hatiye. Pirça wê wekî pêş da geş nîne. Tûka wê

temirî ye. Saxiriyên wê sist û lawaz, zikê wê mezin û skura wê ziravtir

bûye. Dêla wê ketiye nava lingan. Gunehê mirovî pê tê. He kê bera  
xwe

bide Sosikê, dê bizanibe, ko Sosik nexweş e. Kulik hate bal Kerrî û  
gotê:

— Kero bira ezê tişteke bêjim, dilê xwe neke ha!«

— Bêje ka tu yê dîsan çi bêjî!

— Tu bi ya min dikî, sibê eger şerek qewimî, hema li Bilîcanê siwar  
bibe! Qet li Sosikê siwar nebe! Sosik nexweşe. Yê te li meydana şerî  
da

şepirze bike.

— Tu Xudê tu bala xwe bidê lo! Ez dibêjim ta ez şerekî nekim, ez ji  
vir

naçim, tu dibêjî eger şerek hebe. Kuro ezê çawa rabim li hespa  
dijminê

xwe siwar bibim û herim şerê wan. Bila xelk bêjin, tu mêrekî çawayî  
ko

349

BILÎCAN

hespeke te tunebû, tu li hespa me siwar bûyî Vêca dê hîngê bêjin,  
te bi

hespê me mêranî kir. Yê bêjin eger Kerr li Bilîcanê siwar neba, bi me  
nikarî. Çima Sosik çi jê hatiye?

— Bira were wan keviran ji pêşa xwe bavêje! Sosik nexweş e. Sosik  
bi

avên golegeniyên maye. Yê te li meydana şerî da şepirze bike.  
Bilîcan ni-

ha ya te ye. Tu niha xudanê wê yî. Xelk jî, kî çi dibêje, bila bêje.

— Ez qet çî caran wê kêmasî û serdanivandinê ji dijmini ra nakim û  
bi

hespê dijminî naçim pêşiya wan.

— De were her li Nijdiyê siwar bibe.

— Na, ez li hespa te jî siwar nabim.

Hindî Kuliki da û neda, Kerr serwext nebû.

Her çend ko mêjve bû, şevê pencê xwe kutabû ser tefeşa erdê, lê  
mirovî

digot qay hê jî taze seretaya şevê ye. Te digot qay şev qet ji cî nalive.

Qet

naxwaze bilive. Şeveke reş û dirêj û gêrt bû. Kulik serî li ser pêroyan  
nediqetand. Li nava hevalan digeriya. Xew bi çavên kesî nediket. Lê

Kerrî

hema çawa ko pala xwe da cil û cihuran, hema wisan jî xew ra çû û  
seg

bire avê. Te digot qay li bin konê Werdekê da raza ye. Xurîna xewa  
wî bû.

Kuliki Êxo û Buxdo jî şande bal Neimetê Îsi. Ewan jî xwe dane serê  
girê

Şargên Lewendan û guçkên xwe dane ser deng û sedayan. Lê ji bilî  
xurexura xewa Kerrî û mişîna daran li ber nermebayê, çî deng û  
sedayên

dî li ber guçkan nediket. Kulik geh diçû bal nobedaran û geh jî dihate  
bal

Hasûxan û Bilîcanê. Geh jî diçû ber serê Kerrî.

Lê şev qet ji cî nediliviya. Şevê pencê xwe kutabû ser tefeşa erdê û  
nediçû. Şevereş û nihêranî û dijxewî tevî hev bibûn û li ser bêhna  
Kuliki

da peya bibûn.

350 BILÎCAN

43

Meyterê Bilîcanê bi milekî va xwe bi dîwanxana Mîrê Erebanî ra gîhand.

Hêvirze kete nava êlê. Hewariya birina Bilîcanê li qasekê da li nava êla

Mîrê Ereban da belaw bû. Bû birebra mêran û pehlewann û ber bi mala

Mîrî kişyan. Li demeke kurt da bi hezaran xasmêr û egît li ber derê konê

dîwanxanê li hev civiyan. Lê Mîrî dîsan jî ferman da wan û got:

— Niha hindekî dereng e, herin karê xwe bikin, emê sibê zû, li berban-

ga sibê da hê ewan li xewa berbangê da, hêrişê bidin wan û ewan li xewê

da dîl bigirin. Qet nihêran nebin, em cîhê wana dizanin.

Komel weke xîzê çeman û pelgên daran li nav hevdu da qilqilîn û her

kes ber bi mala xwe çû û karê şerê sibêdê kirin. Yê ko şûrên xwe tûj

dikirin. Yê ko serê nêze û rim û sîngiyên xwe tûj dikirin. Yê ko mer-

talên xwe diceribandin.

Hemû carê gava ko hewariyek giran li wan biqewimiya, peyayekê xwe

dida serê girê nîveka êla Mîrî û zoma zarên Hesê Dûdêyî û hawarî li wan dadixistin. Lê vê carê Mîr nehêla ko hawariyê jî li zarên mala Hesê Dûdêyî daxin. Komel hemû nihêranî wê rewşê bûn. Her gav dema ko pûşikeke Mîrî ji cî bileqiya, Mîr wekî qelînekê li ser sêlê tabetî nedihatê.

Lê vê carê hemû zendegirtî mabûn. Karê zemawenda nebiya wî hate şê-landinê, nehîşt kes li dû hawariyê ra here. Mahîna wî ko giştî dar û nedarên wî aliyekî û ew jî aliyekî bû, roj nîvro cerdê hilda û bir, dîsan jî nehêla kes li dû bikeve. Hemû kesên ko di gel Mîrî nasiyar bûn û li ser xû û xideyên wî ketibûn, dizanîn ko divê tişteke giringtir hebe.

Mîr jî rawesta ta ko şev baş dageriya. Tarî kete erdê. Vêca çar, pênc ridênsipiyên xwe yên ko piştta xwe bi wan va girê dida, di gel melayê xwe hilda û buxçikek diyarî girêda û tev siwar bûn û ber bi mala Êzdîn begê kurê Hesê Dûdêyî çûn. Zarên Hesê Dûdêyî hemû li mala birayê xwe yê mezin da rûniştibûn ko Mîrî bi koma hevalên xwe va derî li wan vekir û li ber deri rawesta û got:

— Êzdîn min vê şevê xwînek kiriye û min xwe avîtiye mala te. Min hûn



û Xudê dîtine. Bidin bo xatirê Yezdanê mezin, her çî guneh û  
kêmasiyên

351

BILÎCAN

min jî hebin, ji min bibexşînin. Eva hefteyeke cerdeke nenas li me  
hewil-

iyê û averû jî me ra nehêlan. Mala we nekeve, her çawa be, em  
hemû kur-

din. Her çiya ko ta roja îro li nêveka me û we da qewimî ye, taze  
derbas

bûye. Hemûyan jî ji min bibihorin. Ji we mêrek hatiye kuştinê, ji me  
sê

mêr. Qeziyayek bû, qewimî û çû. Ev çendik û çend sal li ser ra derbas  
bûne. Hûn bixwe jî dizanin ko min her hay bi wê qewimînê nebû.

Niha

ko dilê we ji me ma ye. Dujmin û neyarên me wecê ji vê dilmayînê  
verdi-

girin û rojê derbekê li me didin. Wê rojê hatine karê zemawenda  
Kulîlkê

şêlandine. Me got, çî nake, sene hatine ji xwe ra kûtek revandine.

Îro jî

hatine li ser bîrê, li nava çend hezar malan da, Bilîcan ji meyteran  
stan-

dine û birine. Rojê lekeyekê li me didin. Min hûn dîtine û Xudê. Îro  
ro-

ja xîretê ye. We bizanibin ko min îşev xwînek kiriye û min xwe  
avîtiye

mala we. Sibê siwarên min dê li dû cerdê bikevin. Ez daxwazê ji we dikim

ko hûn her heft bira jî sibê bi me ra siwar bin û em li dû cerdê bikevin.

He navê we li ser siwarên me bikeve, besî me ye. Siwarên me dê bi navê

we serbilind û biwêr bin.

Êzdîn Beg yek bi bejna xwe va ji ber Mîr û hevalan va rabû. Hemûyan

dest li stuyên hev ra birin. Êzdîn Begî cî nîşanî mêvanan da û bixwe jî li

biniya konî li ser darê edebê rûnişt. Paşî xweşbêjî û pirs û pirsiyaran Êzdîn

Begî rabû ser piyan û gote Mîrî:

— Hûn rûnên ta ko em hatin.

Vêca çav kire birayan. Birayên wî hemû ji cî rabûn û ber bi aliyê malê çûn. Êzdîn Begî bi koma birayan va li aliyê malê şêvir danîn. Ro kirin û

pîvan. Mîr bi ridênsipî û melayê xwe va xwe avîtiye mala wan. Ev debeke

mêjîna kurdî ye. Bavkuştîyê mirovî jî eger şev xwe bavêje mala mirovî, di-

vê ko mirov jê derbas bibe. Ewan bixwe jî dizanîn, her rastî jî Mîrî agah

bi kuştina Silêmanî nibû. Qeziyayek bû û qewimîbû.

Birayên Êzdînî hemûyê gotin:

— Şîret û bisparteya bavoye, ko em li himber hêrişên dijmin i da li hawariya Mîrî da herin.«

Paşî got û bêjê, hemûyan ya xwe kirin yek û biriyar dan ko sibê tevî si-

warên wan bibin û li dû cerda nenas bikevin.

Her heft bira li aliyê malê hatin bal Mîr û hevalên wî. Melayê Mîrî buxçika xelatan rakir û li ber Êzdînî danî. Mîr jî ji cî rabû, kurkê xwe yê

mîrîtiyê ji milê xwe şiqitand û avîte milê Êzdînî. Eva mezintirîn xelat bû

ko ta wê rojê li nava hozgelên kurdî da hatibû dayînê. Bi vî cureyî Mîr û

zarên Hesê Dûdêyî li hev hatin. Mîr li şev da zivirî mala xwe û her heft

352 BILÎCAN

kurên Hesê Dûdêyî jî ketin karê şerî û xwe ji cenga sibê ra amade kirin.

Hê taze berê sibêdê gewr dibû, ko siwarên Mîrî li ber derê dîwanxanê

berev bûn. Siwaran rêz girtin. Mîr li pêşiya wan rawesta û got:

— Gelî siwarno! Li cenga îro da mafê we çî kesî tune ye ko hûn dakevin

herafê meydanê. Dijminê me yê vê carê pehlewane kî qerah e. Emê şerê

wî bi hîviya pehlewann va bihêlin. Lawên Hesê Dûdêyî dê her nihe xwe

bi me ra bigehînin. Pêş da geredê bidin pehlewann, paşê ezê fermanê

bideme we ka hûnê çî bikin.«

Li dû vê kurt axiftina Mîrî ra, begzadan girmandin duhola hawarê û si-

war ber bi çemî kişiyên û li rex çemî ketin gewelanê. Lê Mîr bi ridênsipiyên va zivirî dîwanxanê û hîviya pehlewann ma. Bi dengê duhola hawarê ra, her heft kurên Hesê Dûdêyî jî xwe li cil û bergên pehlewann-

tiyê da tev pêçan û xwe bi êla Mîrê Erebanî ra gîhandin. Bi hatina lawên

Hesê Dûdêyî ra, Mîr ferman da çend ga û hêştir li ber piyên wan serjêkirin. Zarên Hesê Dûdêyî li nîveka ser û cendekên ajelên qurbanî ra

derbas bûn û çûne dîwanxanê.

Hindî ko raza kuştina Silêmanî ji devê Kakilê şivanî ra derketiye, ev cara yekê ye, ko zarên Hesê Dûdêyî derê dîwanxana Mîrî ra diçin hun-

dur. Mîr bi ridênsipiyên xwe va li ber pehlewann va rabûn.

Pehlewann qaweyek vexwarin û ji dîwanxanê derketin û li bozên xalx-

alî siwar bûn û ber bi çemî bezandin.

353

BILÎCAN

44

Hê berê sibêdê gewr nebibû ko Kerrî kêlekên xwe guhest. Çavên xwe

vekir. Dîna xwe dayê Kulik hê jî neraza ye û li girê nobedaran tê nava pêroyan û ji nava pêroyan diçe bal nobedaran. Li dilê xwe da bi Kuliki

keniya û got; pir tirsenok e lo!

Gava ko Kuliki dît, Kerr vaye ji xew rabûye, hate ber serê wî û gotê:

— Ezê bi cilkên guhestî va herim serekî li nava Êlê bigerim û bizanim kanê çi heye û çi tune ye û zû bizivirim.

Kerrî bawîşk veda û gotê :

— Here ji te ra oxir be!

Kuliki cilkên xwe guhest. Destek cilkên nîvtaş li xwe kir. Şûr û xencera

xwe li bin da girêda. Li Nijdiyî siwar bû û ji Qîracê daran ber bi êla Mîr

Elî Siwaranî hajot.

Kuliki dixwast, xwe bi mala xalên xwe ra bigehîne û ewan bi vê qewimînê bihesîne. Ewî dizanî eger xalên wan pê bihesin û neyên şerê

wan, talaşa wan bi êla Mîr Elî Siwaranî tune ye. Bi van hizran ji hevalan

qetiya. Qîracê daran li pişt xwe ra hîşt û her di meydanekê da xwe bi lê-

vara çemî ra gîhand. Nijdî zengî kir û xwe li çemî da û derbasî wî alî çemî

bû. Girikek li pêşberî wî bû. Hajote serê girikî. Dîna xwe dayê êleke pir

giran li deşta pişta girikî da daniya. Ser û binê êlê bi hev va nayê xûyanê.

Li bintara êlê deste deste siwar, bînanî kulî û mêhrûyan ber bi lêvara çemî

dikişin. Hejmara xîzên çeman û xezelên payîzê û stêrên esmanan heye, lê

hejmara siwaran tune ye. Tavê li siwaran dida û nêze, gurz, rim,  
mortal,  
kulavqot, bergustuwan û zirêxên wan li ber tirîşka tava sibêdê  
diçilvilî û  
rewneq û tirîşkên wan dikete nava çavên Kuliki. Kuliki zanî ko ev  
leşkerê  
Mîrê Ereban e. Li dû Bilîcanê diçin. Zû zengî li Nijdiyî da û li pişt girikî  
da fitilî. Li bintara giriki da kete şewlekê û ber bi perê konan hajot.  
Dixwest ko li nava zomê derkeve, lap li perê zomê dengê  
meşkkêyan be-  
ra wî li ser xwe da rakêşa. Meşkkêyan bi stiran meşk dikiyan:  
Meşkê dikim sêpîkan  
Ha li ser rêka çerçîkan  
354 BILÎCAN

Kilkê didim qeysîkan  
Seb xatirê xasîkan  
Hil hil meşkê, kil meşkê...  
Meşkê dikêm bo siwaran  
Siwarên gazî û hawaran  
Ser sêpîk û sêdaran  
Nivîşki didime wan yaran  
Jahre didime neyaran  
Hil meşkê, kil meşkê...  
Kil kil meşkê, kilmeşkê...  
Hê Kulik daneketibû ber lêvara çemî ko bi fermana Kerrî ra Elik û  
Loko

xwe dane girê Şargên Lewendan û li duhola hawarê û miqamê  
meyterx-  
anê dan. Bi dengê duhola meyterxanê ra, Kerrî xwe li cil û bergên  
şerî da  
pêça. Li Sosikê siwar bû. Ferman da, ko Hasûxan û Pasûxan, Loko û  
Elik, Buxdo û Êxo jî siwar bibin. Evdurehmanê Terikî jî dane ber  
Bilîcanê û dîtir pêroyan û tev bi miqamê meyterxanê daketin lêvara  
çemî.  
Hê bi lêvara çemî ra negiheştibûn ko dîna xwe danê, waye siwar û  
peya  
bînanî kuhlî û mêhrûyan li çemê derbas dibin û ber bi wan tîn. Kerrî  
gote hevalan:  
— Hûn li vira rawestin! Ji ciyê xwe nelivin. Loko û Elik jî bila hema  
wisan li miqamê meyterxanê bidin.  
Îcar tenê weke gurgekî tekane hêrîş bire ser leşkerên Mîrî. Leşker  
weke  
keriyek pezê bê û şivan li ber Kerrî tîştîşî û tar û mar dibû. Kerrî li  
rastî ra  
lê dida û li çepî ra derdiket. Şûr bû, ko li hewa badibû û serî bûn ko  
li ber  
şûri difirîn û leş bûn, ko ji xanên zînan da jor da dihatin û li ser pêlên  
avê  
diketin. Şîhîna hespan û norîna mêran û zarezara birîndaran bû. Hê  
nîvê  
siwaran ji çemî derbas nebibûn, ko Kerrî ew nîvê derbas bûyî jî, yê  
ko  
kuşt û yên ko ji tirsar ruhê xwe dîsan xwe li çemî dan û derbasî wî alî  
bûn.

Rûyê çemî li ber kerleşên mirov û hespan, li ber mertal û kulavqot  
û çek  
û rextên bêxudan hate vepoşandinê. Kerr her çi siwarên ko li vî alî  
çemî  
jî mabûn, weke garaneke bêgavan da pêşiya xwe û top kir û li avê  
derbas  
kir. Li vê demê da heft siwarên tev girêdayî, hespên wan û cil û  
bergên  
wan hemû li rengekî da, xwe bi siwarên şepirze ra gîhandin. Bi  
gehîştina  
van heft siwaran ra şîrqîn kete leşkêrê Mîrî û hemûyê bi hev ra dane  
gazî  
û hawarê şadiyê û navê zarên Hesê Dûdêyî anîn:

— Bijîn her heft pehlewan!

355

BILÎCAN

— Bijîn zarên Hesê Dûdêyî!

— Bijîn şêr û pilingên çeng bixwîn!

Dengê siwar û peyayan li ser dengê duhola hawarê ket.

Bi hatina siwaran ra dîsan leşkerê Mîrî xwe li avê dan. Heft siwar bi  
hev

ra li avê derbas bûn û leşkerê giran jî dane dû wan. Siwar hemû bi  
aramî

ji çemî derbas bûn. Mîrî ferman da siwaran, ko hemû rêz rawestin.  
Kerr

bi bihîstina navê zarên Hesê Dûdêyî ra li pêşiya her şeş siwarên xwe



rawesta û hêviyê ma, ka xalên wî dê çi dikin. Bi fermana Mîrî ra bi  
heft  
destan li duhola şerî dan. Vî alî jî Elik û Loko digurmînin duholê.  
Dengên herdu aliyan tevî hev dibin û li ser hemû dengan dikevin û  
li hev  
siwar dibin û dikevin çil û çiyar. Vî alî heft siwar û aliyê dî deriyayeke  
pir  
pêle siwaran. Kerrî Sosik anî gewelanê û li ber siwarên Mîrî ra  
bezand û  
mêrê meydanê xwest. Li nava deriyaya siwaran da, Êzdînê kurê  
Hesê  
Dûdêyî yê mezin, zengî li hespê xwe da û bi erebî li ser Kerrî da  
noriya û  
lê helat û gotê:  
— Kuro lawo te êla Eliyê Siwaranî bê xudan dîtiye? Tu hînî bêriya  
bêxudan bûyî, tu rojê têy kûtekî direvînî.  
Kerrî bersiva wî neda û Sosik li ser wî da hajot. Êzdînî rimek dirêjî  
Kerrî  
kir. Kerrî bi mertalê xwe rima wî paş da zivirand û bixwe jî rim dirêjî  
Êzdînî kir. Bû şingêşinga rim û mertalan. Herdu pehlewann rikêfî ser  
hevdu kirin. Bi fermana Mîrî ra siwar hemû rêz rawestane û li şerê  
herdu  
pehlewann dinêrin. Dengê qîrçîn û şingîna rim û mertalan li ser  
dengê  
duhol û zurnayê dikeve. Demeke xurt xal û xarziyan hevdu birin û  
anîn.  
Fîrefîra hespên wan. Piştî demeke xurt Kerrî fesal ji Êzdînî stand û  
kimê

rima xwe li kimê rima wî da asê kir û Sosik paşopê zengî kir. Sosikê Êzdîn

li ser pişta hespî li dû xwe ra kaş kir. Binê rimê li destê Êzdînî asê bû û

çerm û goştê kefa destê wî tev şiqitand, li nava destî derket û kete erdê.

Kerrî derfend nedayê û bi rima ragirtî rikêfî ser kir û rima ragirtî dirêjî

sîngê wî kir. Êzdînî xwe li ber rima Kerrî da aliyekî û serê hespê xwe zivi-

rand û xwest gewelaneke lêde û şûrê xwe ji ber xwe bikişîne. Lê Kerrî

zengî li Sosikê da û da ser Êzdînî. Êzdîn kete pêşiyê û Kerrî serî da ser.

Êzdîn kete terqa meydanê û Kerrî jî bi rima ragirtî kete dû wî. Sosikê li

dû ra xwe bi hespê Êzdînî ra gîhand û Kerrî li para va çar rim li dû hev li

navmîla wî hejmart û rima pêncê li sîngê wî ra havît û Êzdîn li xana zînî

jor da kete erdê. Bû fîrefîra Sosikê û li ser hevalan da vegeriya. Qîjîn bi

leşkerê Mîrî ket. Leşker bînanî deriyayeke pir pêl li ser hevdu ra hurmicî.

Lê Mîrî destûra çî kesî neda. Tenê sê, çar siwar ji nava leşkerî derketin û

356 BILÎCAN

hatin, termê Êzdînî yê nîvegiyan li nav hev ra kirin û li herafê meydanê

hilanîn û birin paşiy meydanê.

Li dû Êzdînî ra xalê duwem, Çekdîn bi gef û gur hêriş anî ser Kerrî. Kerrî dest avîtê, şûrê misrî ji kalanî kişand û rikêfî ser Çekdînî kir. Bû şîrqînên şûran û ringînên mertalan. Xal û xwarziyî hevdu dane ber şûran.

Li ser piştê hespan li dor hevdu ra bûne turik û şûrên xwe dirêjî skura

hevdu kirin. Lê li her hêrişê da mertal bûn, ko dihatin pêşiya şûran. Kerr

û Çekdînî gelekî li ber hevdu dan. Çekdîn bi dilekî birîn şûr diweşand.

Birayê wî yê mezin li ber çavên wî hatibû kuştinê. Xwîn ji şûrê Çekdînî

dibarî. Şûrê wî her li dora skur Kerrî ra dihat û diçû. Lê Kerr pehlewaneke

kirarî bû. Zor li ser hemdê xwe mertalê xwe dida ber şûrê Çekdînî û li dû

fesalekê bû, ta ko kimê şûrê wî li skura Çekdînî ket û xwîna Çekdînî wekî

fîzikanekê fîzikanê hewa û li hewa reqisî û li ser leşê wî û pêşîra hespê wî

da jor da hat. Kerrî derfend ji dest neda û şûrekî dî jî weşande skur Çekdînî û serê wî li ser leşê leq kir. Hespê Çekdîn xwe firikand û Çekdîn

ji xana zîni jor da hat. Bi ketina leşê Çekdînî ra, bû şîhîna hespê wî û cotkî

şeh rabû û li meydanê derket. Bi ketina leşê Çekdînî ra dîsan qîjîn bi  
leşk-  
eri ket. Kerr zivirî nava hevalan û xwe qîşt kir û dîsan hate herafê  
mey-  
danê. Vê carê cotek pehlewan bi hev ra li nava leşkêrê Mîrî derketin  
û  
rikêfî ser Kerrî kirin. Hev ra şûr hanîne serê Kerrî. Kerr kete nîveka  
cotek  
gurgên devbixwînî. Cotek şêrên dilbirîndar û cotek pilingên çeng bi  
xwîn. Tajdîn û Lezgîn bi dilên pir şewat şûr diweşandin. Cotek  
birayên  
wan li ber çavên wan hatibûn kuştinê. Kerr her tenê dikarî li ber xwe  
bide  
û bergiriyê ji şûrên wan bike. Bi destekî mertalê xwe dida ber şûrên  
wan  
û bi destê dî jî şûr li şûrê wan dida û bi vî curî hêrişê wan li ser xwe  
dizivi-  
rand. Êdî karê Kerrî bû bergirî. Her sê pehlewan li xwînê û xûyê da  
mewicîn. Tav hatiye qamê nîvro. Tav li ser serê wan ra rawesta ye.  
Tava  
beriyê ya danê nîvro keviran diavîne. Asinan dibihojîne. Hewa wekî  
do-  
jeheke dax sincirî ye. Zirêx û kulavqotê Kerrî bînanî sêlên sincirî bi  
ser û  
leşê wî va dizeliqin. Zimanê wî li ber tîhna li devî da reş bûye. Tûk li  
de-  
vî da meyî ye. Lê li tirsê giyanê xwe da, ji berxwedan û bergirî û şerî  
pêve

çi tiştên dî li ber çavan ra nayê. Herdu birayên dilşewitî lê hatin hev.  
Hindik mabû, ko şûrê Lezgînî zirêxê pêsîra Kerrî biqelişîne ko şûrê  
Kerrî  
zenda Lezgînî firand. Lezgîn bi destê çepê bi zenda xwe ya rastê ra  
girt û  
xwest ko paşekişê bike, ko Kerrî bi şûrekî ew jî ji xana zînî da jor da  
anî û  
li ser Tajdinî da zivirî. Tajdinî rikêfî ser wî fikir, ko Kerrî şûr dirêjî  
qafê  
wî jî kir û ew jî ji xana zîni da jor da anî. Hêvirze kete nava leşkerê  
Mîrî.

357

BILÎCAN

Deriyaya siwaran ji cî leqyan. Çend siwar hatin û herdu leşên ketî jî  
li  
nîveka meydanê hılanîn. Vê carê sê pehewan bi hev ra ji dilê leşkerî  
der-  
ketin û hêriş anîn ser Kerrî. Şemdîn û Şervan û Şerzan bînanî gurgên  
de-  
vbixwîn û dilbirîn rikêfî ser Kerrî kirin. Her sêyan bi hev ra li sê aliyên  
da  
rimên xwe dirêjî Kerrî kirin. Lê Kerr tu dibêjî qay taze daketiye  
meydanê,  
li ser hemdê xwe bi destekî şûr diweşîne û bi destê dî mertalê xwe  
dide ber  
kimê rîman û rîman ji ser xwe paş da dide. Helkehelka wane. Gelekî  
bi

hev da ketin. Xalan dîna xwe danê ne herê, ev ne ew pehlewana e,  
ko bi zo-  
ra şûr û rîman pê bikarîbin. Şemdîni çav li herdu birayan kir û li ber  
lêva  
xwe da gote herdu birayan:  
Bidin dû min!  
Her sê siwar li naverasta meydanê derketin û li ber Kerrî helatin.  
Kerrî  
da ser wan. Ha li vir na, li dera han. Ta ko her sê birayan berê hespên  
xwe  
dane hezeka qurereşkê. Kerrî jî hema wisan daye dû wan. Hespên  
wan  
tazebêhn bûn. Her sê hespên her sê birayan wekî sê kêrûşkên payîzî  
li ser  
hezekê ra banz dan. Lê Sosik li sibêdê da, li meydana şerî da ye.  
Sosik gi-  
heşte rex hezekê û xwest ko li ser hezekê ra banz bide, lê hezek kuta  
nekir  
û herdu destên wê jî hezekê derbas bûn û herdu lingên wê di  
hezeka qur-  
ereşkê da çik bûn. Her sê bira lê zivirîn û zergên xezebê jî ber gîzmên  
xwe  
kişandin û her yekê heft zerg li navmil û li herdu kêlekên  
Kerrîjimartin.  
Cîhan li pêş çavên Kerrî reş û tarî bû. Kerr li ser pişta Sosikê li bin  
derbêhn  
zergan da li nav qurereşkê da cûm bû. Bi dengê şewat li wan  
qûtand:

— We ez kuştim, lê hûnê çi bersiva Kulik û Werdekê bidin?  
Gava ko lawên Hesê Dûdêyî navê Kulik û Werdekê bihîstin, jê pirsîn:

— Ma tu kî yî?

Bû nalenala Kerrî û taze xwe bi xalên xwe da nasandinê.

Xalan li nav serên xwe dan û bû lûvelûva wan û gotin:

— Way lê mala me kaviil bûyî!

— Way lê Xudê mala Mîrî çol û hol kirî!

— Lê Mîrî digot cerda Ereba ye.

— Kuro lê te çima xwe bi me neda nasandinê.

Li ser termê Kerrî bû şîn û girîn. Xalan bi kopan li nava serên xwe da  
lê

didan. Hersêkan alî hevdu kirin. Termê Kerrî yê nîvegiyan li nava  
qur-

ereşkê deranîn. Li nav hev ra kirin û birin danîn ber siya darekê.

Şureşura

xwînê ye ji navmil û ji herdu kêlekên Kerrî dikişe. Xalan birînên wî  
paqîş

kirin û bi şal û şeirên xwe birînên wî girêdan û bi pûş û pelaşan jê ra  
berpalek çêkirin. Di wê gavê da dîwane Cindî li wan derket û pirsî ,  
kanê

358 BILÎCAN

zarên Hesê Dûdêyî?

Şemdînş pirsî:

— Te bo çî yî? Em zarên Hesê Dûdêyî`ne. Yezdan mala me kaviil bike.  
Dîwane destê xwe li qerpalên xwe gerand û nama nivîştîkî li berîka  
xwe

derxist û got:

— Ev nama, xûşka we Werdekê ji we ra şandî ye. Ka keşkula min jî bidin min. Li min derenge, ezê herim. Rêka min dûre.

Şemdînî name ji destê wî stand û pêça namê vekir û name xwend.

Gava

ko bi naveroka namê hesiya, agir bi serê wî ket û ji dîwane pirsî:

— Dîwane be tu bo hind dereng hatî?

— Xudê ez ji xwe ra li nava êlan li keşkûlê digeriyam. Lema hindekî derengî ketim.

Şemdîni şûrê xwe li ber xwe kişand û yek li tera skura wî da lêda û gotê:

»Hanê ev jî keşkula te. Çavên te ji keşkûlê têr nabe! Çima tu rojekê zû

bihatana, dê çi biba, malçolê malçol!?

Serê Dîwane wekî zivirokekê li erdê zivirî û leşê wî kete nava pûş û pelaşan.

359

BILÎCAN

45

Gava ko Kuliki dengê meşkkêyan bihîst, Dengê meşkkêyan lê kar kir. Biçûktiya wî hate bîrê. Seha tîhnîtiyê kir û dilê wî tasek çeqilmasta mi-

hiyan xwest. Serê Nijdiyî ber bi meşkkeyan zivirand. Dîna xwe dayê meşkeke gamêşî li dar e. Du kiçikan bi lolebên meşkê ra girtine û meşkê

didin ber hingan û pê ra jî stiranand dibêjin. Kiçeke qert jî waye li ser wan



ra digere. Gava ko çavên kiçikê bi siwarekî ket, ko ber bi wan dajo,  
hate

ber derê konî. Kuliki gote wan:

— Mandî nebin!

Kiçikê bersiva wî da:

— Zor sipas!

— Xûşkê bibexşîne, ez rêvîngî me. Ca ji xêra xwe eger hebe, taseke  
dew

yan çeqilmast bide min.

Kiçkê bersiv da:

— Ser çavan!

Vêca li dû gotina xwe ra çû rexê kulînê û ji siwarî ra tasek çeqilmast  
çê

kir û da ser destên xwe û ji siwarî ra anî. Tas li ser destê xwe girt û  
raberî

siwari kir. Her di wê gavê da çavên wê û siwari li hevdu asê bûn. Bi  
asêbû-

na çavan ra, dilê kiçikê lerizî û serê wê kete ber da. Li dilê xwe da  
got;

Xudêyo min ev zilama li kêderê dîtiye?

Lê hindî da nav hişê xwe, nekete bîrê, kanê ev zilama li kêderê  
dîtiye.

Hindî li nav hişê xwe da çû, çi tişt nekete bîrê. Lê çav çavên nasiyar  
bûn.

Te digot qay kiçkê bi salan di gel xudanê wan çavana derbas kiriye.  
Di gel

xudanê wan çavan gotiye û keniyaye. Di gel xudanê wan çavan  
ketiye kêf

û henek û laqirdiyan. Lê hindî hizirî, navê xudanê wan çavan nehate bîrê.

Kulik tasa çeqilmastê hilçinî serê xwe. Tasa vala zivirand û da destê kiçkê. Vê carê dîsan çar çav lev asê bûn. Kiçkê tasa vala jê stand. Kuliki pê

pişta destê xwe simbêlê xwe paqij kir. Kiçkê avirekî tûj dayê. Kuliki avirên xwe ji avirên kiçkê dizî û pirsî: Xûşkê pirsiyar bê xewşe. Mêrên êla

we ko da çûne, ko çi mêrek li nava êla we da li ber çavan nakeve?

Kiçkê bersiv da:

360 BILÎCAN

Ma te nedîtin? Mêrên êla me hemû siwar bûn û li peyê cerdê ketin.

Bi vê bersivê ra Kuliki Kulîlk nas kir û weha bersiva wê da:

— Aha, min got qay siwarên zemawendêne.

Kuliki ev bersiva tiştêkê bi tirane va da.

Kiçikê lê zivirand:

Na zemawend li paş ket.

Vêca bi gotina xwe ra jî girnijî.

Kulik jî pê ra girnijî. Dîsan birûska çar çavan li du dilan geriya. Kiçkê serê xwe kire ber xwe û bi şerm ji Kuliki pirsî:

— Siwaro tu û Xudê û hebînan, ez tiştêkê ji te bipirsim, tu yê ya rast ji

min ra bêjî?

— Bêje ka pirsî te çî ye?

— Pirsiyasr bêxewşe. Tu kî yî û tu yê kû da herî?

— Ez rêvîng im. Ma pêdiviye, ko tu bizanibî, ez kî me?

— Ê, dibe ko pêdivî be jî.

Herdu jî kenîyan. Kiçkê destê xwe da cênîka xwe û li nav hişê xwe da

çû û pirsî:

— Tu û Xudê, çavên te wekî çavên Kulik in. Tu Kulikê Werdekê nînî? Kuliki xwe lê tûre kir û gotê:

— Kulik kî ye? Karê Kuliki tune ye, were xwe bide ber meşkê û bi te ra

bikeve yarî û axiftinan.

Kiçkê êdî lap Kuliki nasî û bi dizgîna Nijdiyî ra girt û got:

Kulik! Xudê kem ta tu peya nebî, ez serê hespê te bernadim.

Hindî Kuliki da û neda, nekarî xwe ji nav destên Kulîlkê derîne. Li çav-

girtinekê da gûna zarotiya wan hate bîrê. Ew demanê ko bi Kulîlkê ra

malkomalko dilîstin. Kulîlk dikre bûk û li piştê perda bûk û zavatiyê da

ji xwe ra peya dikir û tev diketin kêf û henek û laqirdiyan, weke perdeyekê li ber çavên Kuliki ra derbas bû. Li wê bîreweriyê da dilê wî sist

bû û li hespê peya bû. Kulîlkê dizgîna Nijdiyî da destê kenizekê û gotê:

— Hanê hespê mêvanê me a, bibe li piştê konî da tewl bide!

Bixwe jî milê xwe li milê Kuliki da û tev ketin hundurê xîvetekê.

Dîsan

piştî çendik û çend salan, gûna zarotiya wan, li hundurê xîvetê da ser ji nû

dupate bû.

Kulik hînga bi xwe hesiya, ko tav hatiye raserî serê wî. Bi zorê xwe ji nav destên Kulîlkê deranî. Navnîşana mala xalên xwe ji Kulîlkê pirsî û xatirê xwe jê xwest û ji xîvetê derket û li Nijdiyî siwar bû û ber bi ava zirav ku-

dand. Li ava zirav derbas bû û xwe bi her heft konên li rex hev vegirtî ra

361

BILÎCAN

gîhand. Hajote nav konan. Lê çî mêr li nava konan nedît. Ji jinikan pirsî:

— Xûşkê mêrên zoma we li kêderê ne?

Bersiva wî dan:

— Dibêjin cerda Ereban hatine Bilîcana Mîrê Ereban birine, her heft kurên Hesê Dûdêyî li peyê cerdê keti ne.

Gava ko Kuliki ev bersiva bihîst, agir li serî ket. Nijdî zengî kir û bi bayê

bezê ji nava konan derket û ber bi lêvara çemî hajot. Li rex çemî dûrbîn

da ber çavên xwe. Li wî alî çemî bi hezaran siwar û peya rêz rawesta bûn.

Li himberî wan da jî her şeş hevalên wan, Êxo û Buxdo, Loko û Elik, Hasûxan û Pasûxan rawestan e. Lê Kerr diyar nîne. Kuliki xwe li çemî da.

Leşkêrê Mîrî tîştîştî kir û xwe li koma siwaran da û xwe bi hevalan ra gî-

hand û pirsiyara Kerrî ji wan kir.

Hevalan gotinê:

— Mala te nekeve, be tu ji sibê da li kû bûyî!? Kerrî çar pehlewanên di-

jmini kuştin û her taze li pêşiya te li dû sê pehlewanên dî jî ket û ewan ber

bi pişta wî girê hanê kudandin.

Agir bi serê Kuliki ket. Bi bayê bezê ber bi girikê hajot. Giheşte pişta giri. Dîna xwe dayê Sosik waye li qurereşkê da noqim bûye. Kerr jî diyar

nîne. Vî alî bezand, wî alî bezand. Çi tişt nedît. Li milê xwe yê rastê dengê

şîn û girînê bihîst. Li ser milê xwe da zivirî. Dîna xwe dayê waye çend kes

li binê darekê da berev bûne û digirîn. Hajote ser wan. Dîna xwe dayê,

her sê xalên wî yên biçûk li ser serê Kerrî ra rawestane û li ser da digirîn.

Termê dîwane Cindî jî waye ketiye wê derê. Li ser pişta Nijdiyî li xalan

heytrand. Hindî xal li ber geriyan. Kuliki nepejirand. Xalên wî bi neçarî li

ber xwe dan. Bû şingîna şûr û mertalan. Kuliki bi dilekê pir birîn şûr di-

weşand. Xalan jî bi gef û gur hem li ber xwe didan û hem jî li ber Kuliki

digeriyan.

Kerrî li binê darê bi nalîn gazî Kuliki kir:

— Kulik! Kulik! Dest ji xalên xwe bikişîne û were vira! Were min kir  
tu  
neke!

Kulik bi neçarî li ser birayê xwe yê birîndar da zivirî. Xalan jî dane dû  
wî. Tev li ber serê Kerrî rûniştin. Kerrî got:

Kulik bira min bêxeberdaniya Werdekê kir, ev yeka hate serê min.  
Qudetiye ez girtibûm. Ez li xwe bayî bibûm. Min digot qay her  
fermana

dinyayê di destê min da ye. Eger min bi gotina te û Werdekê bikira,  
qet

ev yeka nedihate serê min. Min mala xwe kavi kir û çar xalên xwe  
bi

destên xwe kuşt û ez bixwe jî ketim vê rojê da. Werin êdî şerê xwe  
362 BILÎCAN

bixwetiye bese. Êdî birakujî bese. Gereke her roja roj da me hişê  
xwe

berevî serê xwe bikira. Me li ser şerîta dijminan lîst, lewra ev yeka  
hate

serê me. Guhdariya min bikin, ka ez ji we ra çî dibêjim. Ev yeka Emer  
Axa û Mîrî anîn serê me. Tola me ji wana ra nehêlin. Êdî çî wec û  
mifaya

min ji we ra tune. Ezê bimirim, lê mirazê min li çavên min da ma.  
Herin Sosikê ji qurereşkê derînin û bînin. Min roja roj da nehîşt tu  
serê

wê lêdey, ewê ez şepirze kirim. Here ewê bîne, dûrî çavên min, li  
pişta

darekê da serê wê lêde. Bila ew kula li dilê min da nemîne, ko min nehîşt  
tu roja roj serê wê lêbidî. Lê cendekê Sosikê li derva nehêle. Cendekê wê  
çal bike. Tu cendekê wê çal nekî, teyr û tû yên goştê wê bixon û hestikên  
wê belavî van bestana bibin. Sibê qîz û bûkên êla Eliyê Siwaranî dê bêne  
pincar û bindarûkê, dê darikan li hestikên wê ra bikin û dijîn û nifirînan  
jî li min bikin û bêjin, ev hestikê Sosika Kerê Silêmanî ye, hat Bilîcan bir,  
xwe û Sosik jî da ser.  
Kulik bi xalên xwe va çû û bi hezar û yek zehmetê Sosik ji nava qur-ereşkê deranîn û anîn li dûrî çavên Kerrî li pişta darekê da serê wê lêdan  
û ew li binê kendalekî da binpeç kirin û zivirîn bal Kerrî û gotinê:  
— Me Sosik veşart. Bêje ka êdî çi gotinên te hene!  
Bi bihîstina navê Sosikê ra hêsireke zirav ji kaniya çavên Kerrî jor da li  
ser sûretê wî da şûlikî. Kerr naliya û got:  
— Êdî çi wec û mifaya min ji we ra tune ye. Ez êdî yê mayînê nînim. Werin ezê ji we ra bisparteyên seremerga xwe bikim.  
Kulik û xal li ber serê Kerrî rûniştin.  
Kerrî bi nalîn dest pê kir:  
— Herin li nava êla Mîrê ereban çend mûmiyakar û çend darteraşan bînin. Termê min bidin mûmiyakirinê. Sindirûkekê ji min ra bidin çê

kirinê. Hêkekê têxin mista min ya rastê û milê min yê rastê ji  
sindirûkê  
ra derêxin derva. Sindirûka min bidin ser barê lokê pêşikêş. Ez  
dizanim,  
gava ko we nêzîkî bi zozanan kir, Werdekê bê pêşiya we. Dema ko  
min  
nebîne, yê bizanibe ko ez hatime kuştinê. Ca Werdekê bê bela ji we  
ve-  
negere. Lê gava ko çavên wê li milê min yê derva ko li ser barê lokî  
ba  
dibe, bikeve, yê hegera wê ji we bipirse. Bêjinê Kerrî digot, dinya  
weha  
hatiye, dê weha jî here. Min li beriya Şengarê da dinya kire hêkekê  
û ew  
hêka jî li kevirî da û şkand. Bêjê Kerrî gotiye, min bédiliya wê kir,  
lewra  
mirazê min li çavên min da man. Bêjinê bila şîrê xwe li min helal  
bike.  
Kulik Perîşanê bêxudan nehêle. Perîşanê li xwe mare bike.  
Li vê demê da gewriya Kerrî hişk bû. Tîhnîtiyê lê dest da. Dizanî kanî

363  
BILÎCAN

dûr e û çî aman jî li bal wan tune ye, gote Kuliki, Kulik!  
— Kezeba min ji tîhna şewitî. Zû bike gîzmên min ji lingên min  
bişiqitîne û bibe ser kaniyê ji min ra hindek av bîne.  
Kuliki gîzmên wî ji lingan şiqitand û ber bi kaniyê bezî. Li ser kaniyê  
gava ko av li gîzmên wî werda, dîna xwe dayê letek gurçika wî waye



qetiyaye û ketiye binê gîzmê da. Êdî Kuliki zanî Kerr yê mayînê nîne.

Bi

lez gîzme pak şoşt û hindek av kire binê gîzman û ber bi birayê xwe helat.

Kerrî gîzma avê ji destê Kuliki stand û kişande serê xwe. Bi vexwarina avê

ra, serê wî li ser stu da leq bû û çavên xwe yê bêmiraz ji cîhana derewîn

miçandin. Kulik bi xalan va li nava serê xwe da lêdan. Termê Kerrî ber bi

roj kirin. Çavên wî girtin û piyên wî li ber rast kirin. Bû lûvelûva xalan û

Kuliki. Kulik bi xalan va li nava serê xwe da lêdan û temûrîkên xwe rûçikandin. Dengê nalîna wan guçkê felekê Kerr û dilê keviran kerr dikir.

Koma Kerr û Kuliki li ser termê Kerrî berev bûn. Şîn li ser termê Kerrî gi-

ran bû. Kuliki bi her sê xalên xwe va li ser termê Kerrî sîvankek çêkirin.

Hasûxan û Pasûxan dane ber te mî û Buxdo û Êxo jî şandin dû Evdurehmanê Terikî.

Gava ko dengê şîn û girînê li ser termê Kerrî bilind bû, Mîr fermana paşekişê da leşkerê xwe. Taze leşker dikir ko ji çemî derbas bibe, Kulik bi

her sê xalan va siwar bûn. Çar siwar wekî çar gurgên dev bi xwîn li para-

va xwe gîhandin leşkerê Mîrî. Bi hev ra ji çepî ra lêdan û li rastî ra der-

ketin. Ji rasti ra lêdan û li çepî ra derketin. Li nava leşkerê Mîrî da  
yên ten-

durust ew bûn, ko ji mala xwe nehatibûn. Rûyê çemî li ber xwînê  
sor

dikir. Cenazên mirovan û cendekên hespan, kum, kuloz, kulavqot,  
şeir û

poşî, çarix û gîzme û mertal bûn ko li ser rûyê avê ketibûn. Leşkerê  
Eliyê

Siwaranî yên ko revîn, yên ko hatin kuştinê, yên ko ketin nava çemî  
û

biroda çûn. Yê ko di avê da xendiqîn. Yê mayî jî bi hawar û gaziyan  
pe-

nah xwestin. Gava ko leşkerî penah xwestin, Kulik û xalên wî penah  
dane

wan. Termê Mîr Elî Siwaranî jî, mêjva bû, ko li ser rûyê avê ketibû.  
Kulik

bi her sê xalaên xwe va, ji avê derbas bûn û êla Mîr Elî Siwaranî dagîr  
kirin. Hêriş dane mala wî. Jin û zar hatin pêşiya wan û penah  
xwestin.

Kuliki gote jin û zaran:

— Hemû ji mal derkevin!

Jin û zar hemû ji mal derketin. Kuliki ferman da xelkê êlê mala Mîrî  
pûr bikin. Ew komela ko çend demhejmêran berî niha xwe li ber  
Mîrî da

didane kuştinê û Mîr bigota wan bimirin, nedigotin na, bi fermana  
Kuliki ra her di gavekê da mala Mîrî pûr kirin. Li qasekê da ji wê mala  
gi-

364 BILÎCAN

ran da pûşikek li ser pûşkî nema. Li dû pûrkinê ra Kuliki agir berda  
konê Mîrî. Alavên agirî di qasekê da çar nikarê konî li çembera xwe  
da  
girtin. Gurî li hevdu siwar bûn û bêhna xuzûrekê li hev geriya û der  
û deşt  
da ber xwe, konê çilistûnî bi erdê va bû yek.  
Kuliki ferman da xelkê êlê, ko termên kuştîyên xwe bikişînin. Xelkê  
êlê  
bînanî kuhlî û mêhrûyan rahîştin wê bestê û term bûn ko li ser  
destan û  
li ser darbestan ber bi goristana êlê dikişîyan. Kuliki bi xalên xwe va  
çend  
mûmiyakar û çend dartiraş li nava êlê hildan û derbasî wî alî çemî  
bûn.  
Mûmiyakaran bi ser û ber termê Kerrî mûmiya kirin. Hêkek jî kirin  
na-  
va destê wî yê rastê û mista wî lê dane hev. Dartiraşan jî bi darên  
cengelî  
sindirûkek ji Kerrî ra çêkirin. Termê Kerrî li sindirûkê da cî kirin. Milê  
wî yê rastê ji sindirûkê da derxistin derva. Li dû ra termên her çar  
xalên  
kuştî jî dane ser darbestan û li avê derbas kirin û ber bi zoma mala  
Hesê  
Dûdêyî birin. Her çar term rêz li rex hev da ber bi rojhelat çal kirin.  
Bêhna xweliya taze seranserî besta xîvetan dabû ber xwe. Mirovî li  
her  
alî ko binêriya xwelî bû ko li ser terman qûç bibûn. Li dû çalkirina

kuştîyan ra Kuliki ferman da giştî xelkê êlê li dewsa dîwanxana Mîr Elî

Siwaranî da berev bibin.

Li dû fermana Kuliki ra giştî xelkê êlê li dewsa dîwanxana Mîrî ya ko çend demhejmêran berî niha li dar bû û niha ji bilî hindek argîn çi tişt li

dewsê nemabû, berev bûn.

Gava ko komel hemû xirve bû, Kuliki weha dest bi qisedanê kir:

— Gelî komelê! hûn hemû dizanin, ko mala Hesê Dûdêyî li ber mala Mîrî da, li ber av û axa welatê xwe da, li ber gelê xwe da çi qas xizmetên

giring kiribûn. Hesê Dûdê û her heft kurên wî li giştî jiyana xwe da li xizmeta gel û welatî da bûn. Lê Mîrê Ereban li ser daxwaza Emer Axayî û

ji bona ko du rojan zêde li ser xelkê da mîrtiyê bike, rîşala mala Hesê Dûdêyî bi destên wan da qelandinê. Hûn hemû bizanin û agadar bin ko

hegera vî şerê ne bi xêr û ne bi xweşî vî şerê xwe bi xwetiye Mîr Elî Siwaran û Emer Axa bûn. Wan li bin va ji hevdu ra name şandine û ev

pîlana dijî vê binemalê kişandine. Ewana tenê ji bona wê hindê ko her

dem her ewan li ser serê xelkê jar û belengaz da mîratî û axatiyê bikin, ev

şerê xal û xwarziyan, ev şerê birakujiyê ev şerê xwe bi xwetiye saz kirin û

em xal û xwarzî bi nezanî û neagadarî berdane hev û malên me bi destên

me kavi kirin. Mîr Elî Siwaran giheşte maf û sizaya xwe. Lê niha Emer

Axa hê jî li ser desthelatdariyê ye û hê jî ji bona wê hindê ko axatiya wî her

berdewam be, zor û zulmê li xelkê dike. Emê niha siwar bibin û ber bi

365

BILÎCAN

zozanan herin, her kî dixwaze, dikare di gel me bê. Da ko em bi arîkariya

hev, bi yêkatî û biratî bikarin rîşala hemû Mîr Elî Siwaran û Emer Axayan

li ser axa xwe biqelînin û gelê xwe ji jêr nîrê zordariya wan xulam û dûve-

lankên bîhaniyan rizgar bikin.

Dengê komelê bilind bû:

— Ji bo rizgariya gel û welatî em hemû bi dil û giyan amade ne.

— Em amade ne rîşala dexes û xiniz û xofiroşan biqelînin.

— Em bi dil û giyan amade ne.

— Em hemû amade ne ji bo rizgariya welatê xwe giyanê xwe bext bikin.

— Li rêka welatî da em cangorîn e.

Her yekê bi curekê hesta xwe radigehand.

Kuliki li bersiva wan da sipasbêjî kir û bi xalên xwe va ber bi çemî rê ketin û komelê jî weke keriyek pez dane dû wan.

366 BILÎCAN

46

Termê Kerrî li ser pişta lokê pêşîkêş weke landikekê dihejike. Milê wî yê

rastê ji sindirûkê derxistine derva û hêkek jî li mista wî da ye. Milê wî li

rex sindirûkê li hewa ba dibe. Bi teqla çûyîna loki ra pêş da, paş da tê û

diçe. Kulik jî li ser pişta Nijdî li pêşiya koçê ketiye. Qentera hêştiran û

leşkerê giran jî dane dû wî û ji beriya Şengarê ber bi zozanan diçin. Kulik

ketiye bîr û hizrên kûr û tal da. Xwe ji xwe ra dibêje:

Kerr çima li ser şirîta nemerdekî wekî Emer Axayî leyîst? Çima bêçine

xwe da kuştinê? Çima çar xalên xwe bi destên xwe kuştin. Li ber çi ewî

bixwe jî ew hemû mirovên bêşûc û guneh kuştin? Ew mirovên jar û be-

lengaz û ne agadar ko her tenê bi fermana Mîrî hatibûn pêşiya wan. Gelo

ev hemû mirov li ber ax û ava welatê xwe da hatine kuştinê? Yan li ser dil

û daxwaza Mîr û Emer Axayî xwe bêçine dane kuştinê. Eger Mîr û Emer

Axayî ew hemû mirovana bikirana yek û bi yêkatî û biratî pişta xwe bidana hevdu û biçûyana şerê neyaran, dê bi wê hêza mezin gelê xwe li jêr

nîrê zor û zulma dijminên dagîrker rizgar bikirana û welatê xwe li jêr destên xelkê deraniyana. Lê ev Mîr û Emer Axa ko li bîr û hizra gel û we-latî da nînin. He tenê bîr û hizra wan xweşî û xweşrabihorandina wan e. Tenê di hizra xwe da nin. Hindî tê bîra Kuliki, her di welatê wî da şer û gêre û kuşt û kuştare. Yan xelkê hêrîş dane ser welatê wan û ew li xwînê da xendiqandine, yan jî bi ferman û pîlana serokhoz û mîr û axayan bêçine hevdu kuştine. Kulik di-hizire, di nava hişê xwe da diçe, dîne bîra xwe, her çi diye û çi bihîstiye, li bara şerê xwe bixwetiye da bûye. Hindî ji devê mezinan, ji konemêr û pîrejinan bihîstiye, her li dirêjaya mêjûyê da Kurdin ko bi fermana bîhaniyan hevdu qir dikin. Kurd in ko li ser san, li ser pişîkan, li ser zaran, li ser zozanan, li ser bengeyeke zeviyê hevdu dikojin. Lê kesek nabêje dagîrkeran welatê me dagîr kirine. Werin em zozana xwe ya mezin, ze-viya xwe ya rastîn ji çengê neyaran derînin. Hindî tê bîra Kuliki her mêrên kurdan bûne, ko bi fermana serokhoz û mîr û axayan da li ber xelkê da şûr weşandine û yan jî bi pîlanên wan

ketine pêşîra hevdu û hevdu ji serê riya serokhozan rakirine. Rêk ji serokhozan ra fire kirine. Serokhozên ko ji bilî serokatiya xwe, ji bilî dîwana xwe û berfirebûna heremseraya xwe û ji bilî razîkirina serdestên

xwîn mij, ko çavên wan her dem li av û axa welatiye, li bara çî tişteke dî da

nahizirin. Serokhozên ko ji bona axatî û serokatiya xwe ya pûç û bê wate

amade ne ji gel û nîştiman û heyî û neyiyên xwe bibihorin. Amade ne ji

abirûya xwe û gelê xwe bibihorin, lê ji serokatî û axatî û mîratiya xwe

nebihorin. Mîratî û axatiya ko ji pejirandina bindestiya bîhaniyan pêve çî

weca wê ji gel û welati ra tune.

Kulik serê xwe kiriye nava dêl û bijiyên Nijdiyî û pêş da dikudîne û di-

hizire. Hizrên kûr û dûr. Silêmanê bavê wî her bi pîlana Ehmed Begê kurê Mîrê Ereban hate kuştinê. Bavpîrê wî Eliyê Mîrî dîsan her bi pîlana

neyaran hate kuştinê. Bavê bavpîrê wî Silîv beg dîsan her bi pîlana ne-

yan dermandayî bû. Her çend ko binemala wan jî beg û mîr û serokhoz



bûn, lê serî li ber xelkê û bîhaniyan nedadinîn. He li ber vê hindê bû,  
ko  
dijminan ewan li serê riya xwe hildan û axatî dane destê Emer Axayî,  
ta  
ko bi dilê xwe hespên xwe li ser av û axa welatî da bibeziyên. Emer  
Axayê  
ko ji bona axatiya xwe namûsa xwe, kiça xwe Perîşan avîte mazad û  
her-  
acê û Kerr û her çar xalên wî bi destên hevdu dane kuştinê.  
Ev xan û mîr û serokhozan, van hemû mirovên bêguneh didin  
kuştinê,  
ko bixwe li ser desthelatdariyê bimînin. Tenê giştî hîvî û armanc û  
awatên wan ew e, ko bêjine wan xan û mîr û axa û serokhoz. Axa û  
serokên ko ne di hizra jar û belengazên welatê xwe da nin, belkû  
her tenê  
li hizra heremserayên xwe û dîwanxanên xwe û nav û dengên xwe  
û  
razîkirina serdestan û êşandina bindestan da nin. Ca serdest her kê  
dibe  
bilanê. Ji wan ra ferq nake. Serdest jî baş wan dinasin. Baş li reha  
mirina  
wan ra girtine. Baş pişîka xalo berdêdine wan û wan ji dest dana  
axatî û  
serokatî û mîratiyê ditirsînin û ya dilê xwe bi destên wan diqedînin.  
Her  
çiya ko dilê wan dixwaze, bi destên wana didine kirinê.  
Ev e demanekî dûr û dirêje ko gel li vî derdî da, wekî kelokekî nîvser-

jêkirî li ber êş û azaran per û baskan lev dide. Lê ewan jî her di keyfa  
xwe

da nin.

Hindî ko Kulik ji beriya Şengarê ber bi zozanan rê ketiye, qasekê jî  
ev

hizrana dest jê nekişandine. Zehlê wî ji wî û ji hemû serokhoz û mîr  
û axa

û xanan diçe. Her çî çîrok û serhatî û mêjûya ko li bara kurdan da bi-  
hîstiye, hemû her li bar şerê xwe bixwetiye da bûye. Şerê birakujiyê  
ko bi

neqşe û pîlanên neyaran û bi destên axa û xan û serokhoz û mîran  
li

368 BILÎCAN

Kurdistanê da wekî rîşala penceşêrê penc veda ye û rîşal ajotiye.  
Kesek di-

vê ko evê rîşalê ji bin va hilqetîne. Rîşala kotîbûnê bi çêkirina  
yêkatiya gel

derman bike.

Serê Kuliki bi derd û dûman e. Hey Nijdiyî dikudîne û hey jî li termê  
Kerrî mêze dike û kûr keseran dikişîne û xwe ji xwe ra dibêje:

Çima gereke roja îro Kerr lêda û çar xalên xwe bi destê xwe bikuşt  
û

bixwe jî weha bêmraz bi destên xalan bihata kuştinê? Çima em  
gereke

weha bi fermana neyaran û bi pîlanên axayên dexes û xiniz û  
xwefiroş, di-

jminên gel û neyarên welati hevdu bikujin? Çima gereke em bêçine,  
li ser  
tûyî tuneyî hevdu bikujin; li ser termên hev simbêlan badin û ev  
zikteler-  
ana jî bi xwîna me bijîn û dilê serdestan ji xwe xweş bikin û neyaran  
bi me  
bidin kenandinê?  
Çima gereke roja îro Kerr û xalan hevdu bikuştana? Eger Kerr û  
xalên  
wî dest bidana hevdu û bibana yek, kîjan leşkerî dikarî li himber  
hêza  
wan da rawesta?! Çima minê roja îro bi destên xwe çendik û çend  
siwarên  
kurdan bikuştana û leşên wan biroda berda? Siwarên ko fermana  
wan li  
destê Mîr Elî Swarani da bû. Siwarên nezan û neagadar.  
Niha ko waye ber bi zozanan diçe, eger neçe hêrişê nede ser Emer  
Axayî  
û tola xwe û bira û xalên xwe ji Emer Axayî veneke, xelkê bêjin:  
Kulikî  
bêxîret û newêrek û bizdonek e. Eger hêrişê jî bide ser Emer Axayî  
û  
daxwaza tola xwe jê bike, Emer Axa ko bixwe nayê şerê wî. Dê here  
hin-  
dek jar û belengazên bê hiş û hedam bi navê pehlewana û  
qaremanan  
bişîne pêşiya wî û li ber xwe da bide kuştinê.

Ev hizrana dest ji Kuliki nedikişandin. Êwir bi êwir nêzîkiyê bi zozanan dikan. Lê tebat û aram ji Kuliki ra nema ye. Li nava hişê xwe da diçe. Xwe ji xwe ra dibêje: Li dirêjaya mêjûyê da, ta roja îro çi kesî bi hêza mil û baskan bi me kur-dan nikariye. Lê bi hiş û pîlanan em bixwe berdane hevdu û em bi destên xwe ji holê rakirine. Me bi nezantiya xwe hevdu qir kiriye û rê ji xelkê ra vekiriye, ko me û welatê me bikin jêr çengalê xwe. Me bi sadetî û nezan-tiya xwe hevdu kuştîye û me rêka dagîrkirina welatê xwe ji bîhaniyan ra paqij kiriye. Me bi destên xwe mala xwe kavi kirîye û dijmin li ser serê xwe siwar kiriye. Di kîjan rûpera mêjûya Kurdistanê û di kîjan serhatî û stirana kurdî da hatiye ko dijmin bi hêza dest û lepan bi kurdan kariye. Lê di kîjan rûpera mêjûyê da û kîjan srhatû û setiranê da nehatiye, ko me bi destên xwe hevdu nekuştîbe û me bi destên xwe kelayên xwe kavi kirîbe. He di seranserî mêjûyê da me bi destûr û fermana axa û beg û

369

## BILÎCAN

serok û mîran li ber xelkê da şûr weşandiye. Ji bo berjewendiya xelkê hev-  
du kuştiye. Dijminan bi vir û derew û pîlanan em berdane hevdu. Bi pîlanên neyaran, li ser serokatîyê, li ser axatîyê, li ser jinê, li ser zozanê, li  
ser hespê, li ser Bilîcan û Perîşanan me hevdu kuştiye. Em ketine canên  
hevdu. Em her dem weke şûr û xencereke tûj bûne li destê dijminan da,  
ji bo birîna serê hevdu. Hindî ko neyaran hewceyî bi me hebûne, em  
kîrîne şûr û xencer û destikên sedef û qaşên gewhernîşan û giranbuha bi  
me va kîrîne û em li ber piştê xwe ra kîrîne. Lê gava ko me hemû  
karên wan li pêş xistine û êdî çî karên wan bi me nemaye, em weke çeqoka zen-  
gorî virvirandine nava kîrs û kelêş û kewalan. Ne tenê kesî nezanibûne ka  
em hene, yan na, belkû li ser da hebûna me jî wenda û înkâr kîrîne. Kulîk nikare yek gavê van hizrana ji serê xwe derîne. Herwisan ko diponije, pêş da dikudîne û ber bi zozanan dajo.  
Êwirek mabû ko bigihîjin zozanan, mizginî dane Werdekê ko kurên te  
hatin û Bilîcan jî anîn. Werdekê hêrişî ber derê mala Emer Axayî kir  
û

caniya xezalê jê xwest. Gava ko Emer Axayî bihîst, lawên Werdekê bi leşkerekî giran va ber bi zozanan dihên, ji qulên ruviyan geriya ko xwe tê da veşêre. Ferman da meyteran ko caniya xezalê ji Werdekê ra zîn bikin û ew û Eyşan jî dîsan weke caran li xîveta taybetî da ketin şêvrê. Werdek li caniya xezal siwar bû û bi bayê bezê kudande pêşiya kurên xwe. Gava ko Werdek gihîşte pêşiya wan, dîna xwe dayê, Kuliki waye leşkerekî giran daye ser xwe û ketiye pêşiya leşkerî û ber bi zozanan dihê. Lê Kerr diyar nîne. Bi gef û gur xwe bi Kuliki ra gîhand û pirsiyara Kerrî jê kir. Lê hê pirsê wê li devî da bû ko çavên wê bi sindirûka li ser piştê lo-ki ket. Da nêza xwe û rikêfî Kuliki kir û gotê: »Te Kerr daye kuştinê û tu hê li ber çavên min digerî?« Kulik li dora lokî ra bû turik. Çavê Werdekê li milê Kerrî ket, ko li sindirûkê ra derxistibûn û milê wî li hewa da ba dibû. Bi dîtina wê dî-menê ra, hegera wê hindê ji Kuliki pirsî. Kuliki gotê: »Dayê ev bisparta Kerrî ya seremergê ye. Kerr digot, bêje dayîka min, bila li ber xwe nekeve. Dinya hema weha hatiye û dê weha jî here. Min li

beriya Şengarê da dinya kire hêkekê û ew hêka jî li keviri da û şkand.  
Lê

min bêxeberdaniya wê kir û mirazê min li çavên min da ma. Bêjê  
bila şîrê

xwe li min helal bike.

Bû zarezare Werdekê û avîte se kurê xwe:

Hey wî wî, hey wî wî hey wîwî

370 BILÎCAN

Kero lawo ne min go neçe beriya Şengarê darên bînin...

Kuro malkavilo ne min got xalên te yê şêr û piling û gurgên dev bi  
xwîn in...

Yê çarde zergan li navmilê te bixînin...

Şîrê min porkurê ji difinênên te ra bînin...

Na Xudê yê mirazê te li çavên te da bihêlin, dê termê te li ser min  
dêranê min porkurê da wê bişînin...

hey wî wî, hey wî wî...

Her çend ko Kuliki biryar girtibû, bersiva dayîka xwe nede, lê xwest  
bi

stiran ewê bi kuştina birayên wê jî bihesîne. Li bersiva Werdekê da  
weha

got:

Hey wî wî, hey wî wî...

Dayê dilê min hane, bi me hane, dêranê dilê min hane bi me hane...

Li kevirê çemaqan, li hezekên herîreşkê, şer qewimî, şerekî pir giran  
e...

Xal û xarziyan dijî hev danîn şerekî bêeman e...

Tu yê bes bike pesn û medhê wan birane..

Kerê bêmiraz li te kuştin, çar pehlewane...  
Minê li kevirê çeqmaqan, li hezeka herîreşkê li te bihaniya rîşala biran e...  
Lê Kerrî li min heyland û got, bese şerê birakujiyê, tu nekoje wan xalan e...  
Bila sibê kes nebêje Werdeka dê bê xayî û bêxudan e...  
Minê hersê birayên teyên biçûk ji te ra înane tevî talanan e...  
Hey wî wî, hey wî wî...  
Gava ko Werdekê kuştina birayên xwe jî bihîst, agir bi serê wê ket û  
got:  
Hey wî wî, hey wî wî...  
Kuliko lawo dilê min hane, bi me han e...  
Delalo dilê min han e bi me han e...  
Dilê dayîka te wargehê derd û wan kulan e...  
Lawo ev derda derdê me kurdan e...  
Emê dileyzin li ser şirîta Emer Axa û bîhaniyan e...  
Karê me bûye birakujî û kişandina talanan e...  
Emê hevdu dikujin li ser pere û dirafan e...  
Xelkê û alemê ji xwe ra girtin erd û asîman e...  
Serast kirin dewlet û ava kirin nîştiman e...  
Pêş da birin ferheng û tore û peyv û ew ziman e...

371

BILÎCAN

Lê emê bi şerê xwe bixwetiyê ji hemû gelan paş da man e...  
Were lawo emê destên hevdu bigirin, derêxin ji welati bîhaniyan e...



Emê çê bikin dewletekê bi tevayî û arîkariya hemû şax û hozên di kur-

dan e...

Na Xudê emê bi arîkariya hev ava bikin welatê xweyê şîrîn Kurdistan e...

Hey wî wî, hey wî wî... lawên min nezan in, şêrên min nezan in, hey wî

wî...

Werdek ne ew bû şerê birayên xwe bike û ne ew bû ko bi wan ra rûnê

û şînê bike. Gava ko hersê birayên Werdekê zarezara wê bihîstin, hatin û

xwe avîtin ser dest û piyên wê. Bi fermana Kuliki pêşiya karwan û leşkerî

rawesta. Siwar û peya hemû rêz rawestan. Termê Kerrî li ser barê lokê

pêşeng danîn erdê. Werdekê devê sindirûkê vekir û xwe avîte ser termê

Kerrî. Xal û xwarziyan şîna Kerrî dupate kirin. Dîsan termê Kerrî weke

berê kirin nava sindirûkê û ber bi zozanan kişyan. Berî êvarê bû, ko leşk-

er gihîşte ser kaniya Rihanê. Durust li ser wê kaniya ko Kerrî dil û hinavên xwînavî dabûne destê Perîşanê. Ji Kerrî ra gorek kulan. Leşker

li

ber termê wî ra li rêzê çûn. Kulik li ser termê Kerrî ra rawesta û weha got:

»Kero bira! Eger te bi xeberdaniya dayîka me bikira û te şerê xwe bi

xwetiye nekira, roja îro tu giheştibûy mirazê xwe. Lê te bi gotina dayîka me nekir, da ko akama karê me wiha lê hat. Ez îro li ser gorina te bêmi- razî bi wê axa ko kal û bavê me tê da hatiye veşartinê û bi wê axa hanê ko emê te tê da veşêrin, sûn dixom, ta ko ez hebim, ez êdî ne şerê xwe bi xwetiye dikim û ne jî serê xwe li ber bîhanî û dûvelankên wan xwar dikim.« Piştî axiftinê Kuliki termê Kerê bêmiraz sipartin axê. Werdek bi Kulik û leşkerê wî va ber bi mala Emer Axayî diçûn, ko Emer Axayî bi nexşên Eyşanê herdu gîzmên xwe tijî xwelî kir û bizmikên gîzman bi hev ve girê da û avîte stuyê xwe. Topek cawê sipî danî ser xweliyê. Şûrê xwe ji kalanî kişand û danî ser. Mishefa Reş jî bêkiras kir û danî rex şûrî û der- kete pêşiya Werdekê û Kulik û leşkerê wan û bi zelûlî got: »Werdek tu û Kulik yan bi vî şûrî serê min lêdin û evê topa cawî li min werkin û evê xweliyê birijînin ser min. Yan jî bidin bo xatirê vê Mishefê û gunehê min li min bibexşînin.« Kulik ji hespê xwe peya bû. Mishef ji ser destê wî hilanî. Şûrê wî kire kalanî û li ber ra kir. Xweliya gîzmên wî vala kir û gotê gîzmên xwe pê ke.

Li dû ra kelebçe vekir û herdu destê wî li piştê girê da û got:  
»Eger gunehê te tenê ev pîlana bûya, minê ji Werdekê û xalan  
daxwaz  
bikira, ko ji gunehên te derbas bibana. Lê gunehên te yek û du nînin.  
372 BILÎCAN

Emê te bispêrin destê dadigeha gelîrî. Dadigehê çî biryar girt, emê  
cî bi cî  
bikin.«  
Û bi gotina xwe ra, Emer Axa da destê Hasûxan û Pasûxan û her sê  
xalên xwe û ew li kela kûla nêçîrgehê da zindanî kirin.  
373  
BILÎCAN

47  
Emer axa li kûlê da zindanî bû. Werdekê jî agirek li ber serê gora  
Kerrî hil  
kir. Agir bi gezan qulozî hewa dibû û ta nivê şevê jî her geş bû.  
Perîşanê  
xwe serdanpê reş û heş kir. Cotek guliyên xwe li ser xoşteviyê xwe  
yî  
bêmiraz da birî. Her du lamên xwe ta binçena xwe da ber  
pencerûskan û  
dirandin. Mirazê wê jî wekî mirazê Kerrî li çavan da mabû. Ji bona  
Kerrî  
xwîn digiriya. Wê şevê ji bona Kerrî xew li çavên çî kesî neket.  
Werdekê  
qelema xwe hilda û ji seranserî hoz û mal û malbatên kurdan ra ev

nameya nivîsî:

»Gelî Kurdên hêja û dilşewitî!

Her wekî hûn hemû dizanin, ev demaneke dirêj e ko Emer Axa bi destên dewleta dagîrker li ser serê me kurdan bûye hemûkare. Ew li cîhê

wê hindê da ko xizmetê ji gel û welatê xwe ra bike, li xizmeta dijminê gelî

da ye. Pêşiya her baş gotine: Kurmê şîrî, her ta pîrî. Emer axayê ko bi

xinizî û dexesiyê firşkê xwe vergirtiye û xîmê wî bi destê bîhaniyan hatiye

danînê, nikare ji gelê xwe ra bibe mirovekî xudanxêr û xêrxwaz. Ew bi

fermana neyaran rojê hozeke kurdan ji nav dibe. Çi sal nîne ko ew bi

neqşe û pîlanên neyaran çend hozên kurdan bernede pêsîra hevdu û agirê

şerê birakujiyê li nava gelê kurd da gur neke. Çi sal nebûye ko ew bi fer-

mana neyaran komek kurd ji cî û warên wan, ji welatê wan raneqetîne û

derewar û berîdeyî welatên dereke neke û dijmin û neyaran li cî û warên

wan da cîwar neke. Bêgotin hûn hemû niha baş dizanin û pê hesiyane, ko

ewî bi dexesî û neyartî herdu kurên min yên genc û xêşîm bi şer li sr xalan

da şand. Ew bû heger ko kurê min yê mezin û çar birayên min û bi

hezaran kurdên bêguneh bi destên hevdu bêne kuştinê. Vê gavê êdî  
qur-

mê dexesiya wî li ser avê ketiye. Gel hemû bi xayînetiya wî agadar  
bûne.

Îro Emer Axa li ber hegera dexesî û xayînetiya xwe bi destê gel  
hatiye girt-

inê û di zindanê da ye. Roja eyniya tê emê Emer Axayî li pêş çavên  
giştî

komelê dad bikin. Tikaye hûn jî li wê rojê da li dadgeha komelê da  
amade

bibin. Her kê jî her cure sikalaya wî ji Emer Axayî hebe, dikare roja  
îniyê

bigehtë destên dadivan û dadistanên komelê.

Xûşka we Werdeka Hesê Dûdêyî

Destîne:

374 BILÎCAN

Sibêda wê rojê bi fermana Kuliki ra Elik û Loko li duhola hawarê dan.  
Ji her alî komel ber bi zomeya Werdekê kişiya. Leşkerê Kuliki li warê  
kaniya Rihanê çadur û xîvetên xwe vegirtin. Teter û peyakan  
nameya

Werdekê dane destên xwe û zome bi zome û êl bi bi êl û gund bi  
gund û

bajar bi bajar gerandin. Ji her alî mal û malbat û êl û hozên kurdan  
ber bi

warê kaniya Rihanê kişyan.

Roja îniyê pê ra gihîşt. Taze tavê lêdabû, ko Emer Axa bi kot û zincîr  
û

kelebçe anîn naverasta zomê. Besta nêçîrgehê û zomeya kaniya  
Rihanê li  
ber mirovan reş û tarî bû. Sê dadivan û du dadistan li ser rûniştekan  
ke-  
virîn rûniştibûn. Li her alî name û sikalaname bûn ko komelê raberî  
wan  
dikirin. Emer Axa li himberî dadivanan li ser pê rawesta bû. Uskura  
xwe  
xwar kiribû. Serê wî di ber da bû. Şerm dikir, li nava çavên gelê xwe  
binêre. Dadivanan pirsiyar li dû pirsiyarê ji Emer Axayî dikirin:  
— Emer Axa gelo rast e, ko te bi destiyariya dewletên dijminan Silîv  
Beg û li dû ra jî kurê wî Eliyê Mîr daye kuştinê, da ko tu rê ji axatiya  
xwe  
ra vekî?  
— Emer Axa gelo rast ko tu bûy hegera şerê birakujiyê li nîveka  
hozên  
Kîkan û Sîpikan da?  
— Emer Axa ya rast bêje! Gelo tu bûyî heger ko herdu malbatên  
Rindik û Findikan hevdu rehbirandî bikin?  
— Emer Axa gelo rast e, li sala şêstan da li zozanê Bêlanan da te  
dest-  
dirêjî bi kiça rênçberê xwe kiriye?  
— Emer Axa gelo rast e, te bi fermana dewleta dagîrker pêncî  
gundên  
Kurdan li Aranê ji kurdan standiye û paşê te neyar gel di wan  
gundana da  
daye rûniştandinê?

— Emer Axa gelo rast e, te kevirê xîmê xaniyên gundiyan firotiye ne-

yarên gel?

— Emer Axa gelo rast e te herdu zozanên berereş û berezîvan ko av û

axa welatê meye, pêşkêşî kardarê dewleta dagîrker kiriye?

— Emer Axa gelo rast e te sermeyterê extirmexana xwe ji bona ko tu ji-

na wî li xwe mare bikî, avîte nava dest û piyên hespên cexur û da kuşt-

inê?

— Emer Axa gelo rast e dibêjin te nobedarê xwe li bin dar û tajankan da birîndar kir û paşê nobedarê te her bi wan birînan mir?

— Emer Axa gelo raste, ko te bi dexesî herdu kurên Werdekê yê genc

û xeşîm bi şer li ser xalên wan da şand û li dû ra li binê va te name ji Mîrê

Ereban ra şand, ko xalên wan pê nehesîne û bi şer wana berde pêsîra hev

375

BILÎCAN

û bi destên hevdu wan bidin kuştinê?

— Emer Axa gelo rast e?

— Emer Axa gelo rast e?

Pirsiyar li dû pirsîyarê û gazinde li dû gazindan û sikala li dû sikaleyan

ra li ser Emer Axayî da barîn.

Serê Emer Axayî li ber da bû. Pêş da li bersiva du, sê pirsiyaran da li ber

xwe da û ew gotinan mandel kir û got îlava li min dikin. Lê bi mandelki-

rina her sikalayê ra dengê komelê bilind dibû û komelê bi hev ra gazî

dikirin:

— A, rast e.

— Em bîner û gowane.

— Me bi çavên xwe dîtin.

— Me bi guçkên xwe bihîstin.

Gava ko Emer Axayî dît, komel waye li himberî wî rawestayê û gotinên

wî hemûyê derdêxin hêçê ra, serê wî kete ber da û êdî zimanê wî negeriya

û her bi hejyareya serî gotin û pirsên dadivanan rast derdêxist û her yek-

sere xwe da destê dadivanan û li bersiva her pirsiyarê da serê xwe bi

wateya erîniyê dihejand.

Paşî wê hindê ko pirs û pirsiyar û sikala kuta bûn, koma dadistan û dadivanan li ser hev quricîn. Li dû ra dadistanek hilkişiya ser serkoyekê û

bi dengê bilind biriyara dadgeha komelî ya kutayê weha ragehand:

Li ser sikalaya gel û biriyara dadgehê, Emer Axa bi tawana xinizî û dex-



esiyê li dijî gelê xwe, bi tawana çêkirina şerên birakujiyê li nav gelê  
xwe

da, bi tawana firotina nîştimani, ko dayika gel e, bi tawana firotina  
gel û

welatî, bi tawana kuştina xelkê bêguneh, bi tawana destdirêjîkirinê  
li ser

mal û can û namûsa gelê xwe, bi mirinê tê siza dan. Sizaya Emer  
Axayî

roja îro li ber çavên gel mirandin e.

Koma biriyarîdera dadgeha gelêrî

Bi ragehandina vê biriyarê ra komel weke deriyayê li se hev ra  
hurmicî.

Dengê şadî û xweşiyê ji her alî bilind bû. Serokê dadigehê gazî kir:

»Tikaye bêdeng bin!«

Komelê piştî du, sê caran ko Serokê dadigehê daxwaza bêdengiyê ji  
wan kir, xwe kir kirin. Li dû ra sêdarek li nêveka meydana ko komel  
lê

berev bibûn, çeqandin. Emer Axa anîn ber wê sêdarê. Kapek avîtin  
sku-

ra Emer Axayî. Emer Axa hilkişandin ser sêpayeyekê. Serokê  
dadigehê

dîsan bi dengê bilind gazî kir:

»Hey komela dilşewitî! Eger hûn bipejirînin, me Werdek ji bo cî

376 BILÎCAN

Înanan sizaya Emer Axayî helbijartiyê.»

Bi hezaran dengê bi hev ra sîngê esmanî qelaştin û ber bi hewa bilind  
bû.

— Em dipejirînin.

— Me pejirandiye.

— Bijî Werdek!

— Bijî Werdeka dilşewitî!

— Bijî Werdeka pehlewan!

— Serokê dadigehê dengê xwe li ser dengê komelê xist û got:

»Em tikayê ji Werdekê dikin, ko ji bo bi cî înanana biryara mirandina Emer Axayî bê rex sêdarê.«

Bi dengê Serokê dadigehê ra Werdekê komel qelaşt û li nava gazî û qûtîna komelê da xwe gîhande rex sêdarê. Bi hezaran çav li destê Werdekê bûn û hêviyê bûn kanê Werdekê çi bike.

Serokê dadigehê got:

— Werdek tu hem xûşka kuştiya yî, hem jî dayîka kuştiyan. Tu li vê dadigehê da ji hemû dadxwazan dilşewitîr î. Em ji layê giştî komelê mafê sizadana Emer Axayî didin destên te. Niha tu dikarî li dewsa her çar

birayên xwe û kurê xwe yî bêmiraz û hezaran kesên dî ên bê sûc û bê-

guneh ko bi pîlanên Emer Axayî hatine kuştinê, yan zor û zordariyek bi

wan hatiye kirinê, sêpaya li jêr lingên Emer Axayî bikişînî û ewî bigehînî

sizaya kiryarên wî yên nemirovanî.

Li dû destûra Serokê dadigehê ra, Werdekê avirek da Emer Axayî û berê xwe li ser komelê da kir û weha got:

— Gelî komela hêja û giranbuha! Gelî bira û xûşkên dilşewitî! Hûn hemû bîner û gowan in, ko koma dadigeha gel, sizaya mirandinê ji Emer

Axayî ra derînane.

Bi vê gotinê ra dengê komelê bilind bû, hemûyê bi hev ra gazî kirin:

— Mirin ji bo gelfiroşan!

— Mirin ji bo welatxoran!

— Mirin ji bo dijminê gel û welatî!

— Mirin ji bo Emer Axayê dexes û xayîn!

Werdekê dengê xwe bilind kir û got:

— Tikaye bêdeng bin! Tikaye bêdeng bin!

Komel li dû du, sê dangan ra bêdeng bû. Werdekê li dû axiftinên xwe

ra girt û got:

— Gelî komela hêja, hûn hemû gowan in, ko li dadigeha gel da sizaya

377

BILÎCAN

mirovên gelfiroş û welatxor yê weke Emer Axayî merg e. Lê gelo bi

kuştin û li darê dana Emer Axa û yê wekî wî, karê me yê serast be?!

Çi deng ji komelê derneket. Werdekê bixwe bersiva xwe da û got:

— Bêgotin karê me bi kuştinê serast nabe. Em gereke bigerin, reh û rîşa

van kiryarana bibînin û hegeran li rîşalê da hilqetînin. Li ber çavên we

hemûyê û her wisan bi pejirandina we dadigehê nûneriya gel daye min

ko ez li dewsa we sêpayê li jêr lingên Emer Axayî bikişînim û ewî bige-

hînim sizaya kiryarên wî yên nemirovanî. Lê bi dîtina min  
zindîkirnewe

ji kuştinê çêtir e. Ez weke dayîkeke kurkuştî û xûşkeke birakuştî ji  
mafê

xwe yê sizadanê dibihorim û daxwazê ji we jî dikim, ko ji gunehên  
Emer

Axayî derbas bin.

Komela mirovan bînanî lêmişteke payîzî li ser hev û ber hev ra  
hurmicî

û bi hev ra gazî kirin:

— Bijî Werdek!

— Bijî dayîka dilovan!

— Bijî dayîka me kurdan!

— Ser xwe bî Werdek!

Werdekê destê xwe li ser komelê da hejand û dengê xwe bilind kir  
û

got:

— Ez zor sipasê ji hewe dikim ko hûn ji mafê xwe derbas bûn. Ez bi  
rê-

dana we, sizaya mirina Emer Axayî pileyekê dînime xwarê û  
daxwazê ji

dadigeha komelî dikim ko sizaya derewarkirinê ji Emer Axayî ra  
bibirin

û malê wî jî malmirî ragehînin. Êdî ciyê Emer Axayî li Kurdistanê da  
ne-

ma ye. Ji roja îro şûn da Emer Axa û jina wî Eyşan derewarkirîne.  
Ewna

li dervayî Kurdistanê, li kîderê da dimînin bixwe dizaninê.

Dadivanan li dû axiftinê Werdekê ra, kapê skura Emer Axayî vekirin  
û

ew û Eyşan dane destê Hasûxan û Pasûxan û li Kurdistanê derxistin.  
Komelê Werdek dane ser destên xwe û ew ber bi konê wê birin û  
Werdek ji xwe ra kirin serwêra hemû welatî.

Piştî hefteyekê hat û çû û şîn û serexweşiya mala Werdekê kuta bû.  
Piştî

şînê Elik û Loko li der mala Werdekê li miqamê çemerçopiyê dan û  
govend li dermala Werdekê çep zivirî.

Li ser bisparteya Kerrî Perîşan ji Kuliki mare kirin. Werdekê bi  
serçopiyaya zemawenda Kulik û Perîşanê ra girt û govenda çep gerand  
û bi

dilekî şewat got:

Şîn û şayî rewşa jiyane ye. Dinya hema weha hatiye û dê weha jî  
here.

378 BİLÎCAN

SIDQIYÊ HIRORÎ

roman

BÎRA QEDERÊ

2

MEHMED UZUN

NEFEL

Stockholm

2002

www.nefel.com

info@nefel.com

3

BÎRA QEDERÊ

Mehmed Uzun:

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 arsta / Sweden

www.nefel.com

info@nefel.com

© Mehmed Uzun û Nefel

aapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91 -89687-11-6

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike. aênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Mehr licht (hinekî din ronahî)...

Goethe

Ez vê romanê pêşkeşî

Xanima hêja û delal

Rewşen Bedirxan-ê dikim

Mehmed Uzun

5

BÎRA QEDERÊ

6

êdî fotograf ê bipeyivin...

»Nav: Gengre (çeşn): Roman Tarîxa destpêka nivisînê: 15 Tîrmeh 1951

Destpêk: Herkes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas.. hemû wefat dikin. Dora min jî hat, niha jî dora min e.

Di rûpela yekemîn a deftereke biçk de, bi destnivîseke gelek xweşik û xwar, weha hatiye nivisîn. Di vê şeva kesertijî de, nivîs bi ronahiya çirayêke biçk, bi zehmetî dixuyin. Rêz, berî niha bi hefteyekê,

hatine nivisîn û rêzên herî dawîn in k o li pey Celadet Alî Bedirxan, neviyê mîrê dawîn ê mîrekiya kurdî Cizîra Botanê, Mîr Bedirxan, lawê kurdperwerê navdar Emîn Alî Bedirxan, mane. şev e. îşev 22-ê tîrmehê ya 1951-an e. şev, şeva ko dora romana Bîra Qederê rapêaye, bi giranî daketiye. Dinya germ e. şam, b ajarê sirgûnê, warê derd û keseran, goristana malbata Bedirxanan, şahîdê mirina Celadet Alî Bedirxan, westiyayî, dikeve xewê. şeva giran û westiyayî rûniştevanên bajarê kevn û navdar şamê dixê nav hêlekana xewê û dilorîne. Xalîeya ji stêrikan pêkhatî, li jo r, li esmanan, bi rengên xwe yên xas ên welatê rohelatê, li xewa şeva şamê nobedarî dike.

Lê li şama miqedes û şerîf a misilmanan, jineke navsal ranezaye; Rûşen Bedirxan, keça Salih Bedirxan, jina Celadet Bedirxan, diya sê zarokan, Huseyma, Sînemxan û Cem9 99îd . Xew jê dûr e. Ev bûye hefteyekê ko xew neketiye çavên wê. Belê, bi temamî hefteyekê... Ew dixwaze, pir dixwaze ko razê, her tiştî ji bîr bike, deng, pejn, hîs jê bi dûr bikevin û bikeve nav xewa b êdawîn û here da ko xwe bi hevalê x we yê jiyane Celadet Beg bigihîne. Lê nabe, xewa ko hertim li kêlekê bû, hertim dihat û çavên wê di- girtin, niha winda bûye. Reh û damarên wê vekişiyayî, xwîna wê miçiqî, devê wê kilîtb ûyî, bêhereket û bêlebat, ji hefteyekê û vir ve, ew hişyar e. Ji heş, bîr û mêjî pê ve, her derê wê miriye, winda bûye. Bi tenê mêjî, heş û bîr jîndar in, ji her carî bêtir û xurtir jîndar in. Roj û bûyerên bihurî,

7

gotin û xeberdanên do, tahm û bîhnên jibîrbûyî, niha, yek bi yek, tînen û li dora Rûşen Xanimê digerin. Umrekî dirêj, jiyaneke rengîn, niha, digel her kitekitê, bi ser wê de tê. Her tişt, her alî, her gotin, her gav, her rêz û rûpela jiyana Celadet Beg, niha, bi awayekî ecêb, tînen bîra Rûşen Xanimê.

Niha, di vê şeva germ û kambax de Rûşen Xanim jî dixwaze bikeve pey Celadet Beg, pê re bikeve nav xewa ebedî, here ba wî. Lê çawan?

Celadet Beg niha tune ye, winda ye. Meriv çawan hînî windabûn û windakirinê dibe? Kursiya wî ya ko ew hertim li ser rûdinişt, niha, vala ye. Ken û dengê wî yê navdar di nav dîwaran de, li derekî, veşartîne. Peyv û gotinên wî yên kîbar nayên bihîstin. Masa wî ya xebat û nivisînê, bêzar û ziman, li hêviya wî ye. Pênûs, defter û kitabên wî, peregende, li ser mase û refan, li hêviyê ne. Pakêtên wî yên cixarê, plakên wî yên musîka klasîkli hêviyê ne. Kinc, cil û bergên wî li hêviyê ne. Zarokên wî li bend a b avê xwe ne. Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê wî, nexweş, di nav nivînan de, li hêviyê ye. Kewên wî yên yekta, çavgirtî, li benda fîtika wî ne... Lê ew nayê, ew tune ye. Ne li vê odê, ne li oda razanê, ne li hewşê, ne li kêleka bîrê, ne li çapxanê, ne li klûba tucaran a bajêr, ne li qahwexana taxa Muhacirîn û ne jî li tu derekî din... Niha, bi tenê hîsa windabûnê ya biquwet û xurt heye. Meriv çawan fêrî vê hîsê dibe? Mirinê hat, Celadet Beg û bedena wî bir û li pey xwe jî ev hîsa kambax xiste nav malê. Vê hîsê niha mal vegirtiye. Malê reşa xwe girêdaye. Ji roja mirinê û vir ve ye, mal, Rûşen Xanim, zarok, nas û xizm, meriv û dost li şînê rûniştine. Roj bi girî dest pê dikin û diqedin. Bi sedan, bi hezaran kes tîn. Rûşen Xanim, herç ew e, bûye dîla hîsên bêdeng. Ew li oda rûniştinê ya mezin, navenda jiyana wan a ko ew hîn bûbûn, li erd, dîwar, têkber, xalîçe û kursiyan dinihêre û bêdeng difikire. Zarok razane, heye ko ew ranezane, lê ji jûrên wan deng nayê.

Mêvanên ko ji bo şîn û tahziyê hatine, hin di odên mêvanan û hin jî di malên nas û dostan de razane. Rûşen Xanim ne li ser kursiyê, lê li erdê, herwekî ko Celadet Beg pirî caran fikir, rûniştiye. Na, ew rûneniştîye, li ser kêlekê dirêj bûye: Li kêlekê du xwelîdank tijî xwelî û cixare hene. Li berê çaydankeke biçk, qedeheke nîvtijî û şekirdankeke hene. Li kêleka wan, nameya ko Celadet Beg, berî mirinê nivisîbû, heye, »Yavrum Rûşen...« Hema li ber, deftera ko Celadet Beg ji bo nivisîna romanê hilbijartibû, vekirî, li pêşiyê ye. Li doralîyê jî tiştên ko li pey Celadet Begê mane, p eregende, li vê derê, wê derê, belavbûyî hene; kaxiz, defter, kitab, kovar, rojname,



name, pênuş û resim... Bi taybetî jî resim, şahîdên umrekî balkêş û zimanê romana Bîra Qederê. Her yek li derekî, di wexteke bihurî de, hatiye kişandin. Niha, di vê bêdengiya şîn û keseran de, bi rengên şevê rapêçayî, resim, bi zimanê xwe yê taybetî, dipeyivin.

8

Gelo ev jiyana Celadet Begê, jiyana ko mîna romaneke pir balkêş e, dê, êdî, bi windabûna Celadet Beg re, winda be? Jiyana wî, xebat, berhem û eserên wî dê ji bîr bibin? Ev kovarên wî Hawar, Ronahî ko wî bi hezar zehmetî û dijawariyan derdixistin ê di nav refan de birizin? Wexta malkambax ê her tiştî bide jibîrkirin? Şopên wî dê, mîna berfa ber tavê yan jî nivîsarên li ser qûmê, hêdî hêdî bihelin û winda bibin?.. Yek Xwedê û yek jî Rûşen Xanimê dizanî ka wî çiqas eziyet dikişand da ko bikaribe berhem û eserên xwe biafirîne. Ew xebat, neçarî, êş, feqîrî û eziyet... Ma ew ê niha winda bibin?

Dîsan girî dikeve çavên werimî yên Rûşen Xanimê û hêstir hêdîka resimekî ko li berê ye û li Stembolê, atêlya fotografî ya «Abdullah Freres», hatiye kişandin, şil dikin.

Ew cixareyeke nû, bi cixara ko di destê wê de xelas dibe, vêdixe, li dora xwe dinihêre û difikire. Fikir, hîs, pejn û guman li dora roniya çirê di- firin. Gotin û peyv qediyane, winda bûne. Mixabin, hezar mixabin ko ev weşan û resimên ko li berê ne, napeyivin. aima ew rêzên xweşlihevhatî yên Celadet Beg ji nav rûpelan dernakevin û dest bi peyivînê nakin? Ev şîr, ev çrok, ev serpêhatî, ev nivîsar... çima ev jî mîna Rûşen Xanimê bi tenê bêdeng in?

Ya ev resim û wêne? Nemaze ev resimên ko şahidê jiyaneke dirêj û qedereke balkêş in? Ma ev fotoyên ko niha li berê ne û li pey jiyaneke dijwar û rengîn, kesertijî û bedew mane, dê weha bêdeng û stûxwar bimînin û birizên? Ev ê, bêzar û bêziman, biqulibin ser rengê zer û mîna pelên zer ên payizê biweşin? Ma ev ê bi tenê bibin xewneke wexta bihurî? Ma ev ê nepeyivin û xwe li hember herikîna wextê ranegirin?..

Rûşen Xanim li resimekî kêlekê dinihêre. Ew xwe dide hev, li erdê rûdine, resim digire destê xwe û bi hizr û dîqet lê dinihêre; Celadet

Beg, sal divê 1926 be. Enî vekirî ye, çav mîna çavên teyrê elo bi xwe bawer û vekirî ne. Porê wî yê ber bi paşiyê şehkirî û reş, dibiriqe. Poz, pozê nas ê Bedirxanan e; mezin, dirêj û xweş. Kincekî nû û reş, bi gotina fransizan kostumek ko diyar e, ji destê terziyên yekta derketiye, lê ye. Qirawateke xweş a hewreşîmî û bi nixtik, mîna her gav î, kincan û gomlega spî xweş li hev tîne. Yêlegê wî ko perçeyekî ji kincan e, bi şeş qumçikan e û qumçik hemû, heta sîngê, girtî ne. Celadet Beg hinekî xwar sekiniye û herdu destên wî di bêrîkên pantolonê de ne.

9

Rû hinekî gulover e. Simbêl û rîh nîn in. Heye ko loma hinarikên rû mezintir û gilovetir dixuyin. Enî û pêşcênik gelekî vekirî ne. Biriyan çavan, ji hevûdu baş veqetî, dirêj û reş in. Bijang di bin reşahiya biriyan de winda bûne. Lê bîbik mîna du lûlûyên reş in û dibiriqîn. Niha? Ew ê niha bi tenê di nav van resiman de bimîne? Gelo qedera wî, ev bû? Rûşen Xanim radibe ser piyan, fotografên ko li dora wê peregende belav bûyî ne, yek bi yek, dide hev û dîsan tê li erdê, li cîhê xwe rûdine. Ji çilî zêdetir resim. Ji çilî zêdetir kurte-demên bihurî û qeyitkirî. Li vir û li wir. Hin ji wan bi hunermendiya fotografkêşên hoste hatine kişandin. Di hinan de jî ne huner û ne jî hostahî heye, ew bi tenê ji bo îspatkirina jiyana, wext û demên bihurî hatine veşartin. Hemû jî bi rengên reş û spî ne. Bêguman çeşnên reş û spî jî tê de ne; hin vekirî ne, hin jî girtî. Hinênwan portre ne, nîşana jiyana Celadet Begê ne. Di hinan de jî gelek kes bi hev re ne, îspata yekbûn, hevgerî, hevkarî, dostî, merivahî û biratiyê ne.

Hin jî bi tenê bergeh in, cîh û warên ko jiyaneke tê re bihuriye.

Rûşen Xanim li rû û bedenên kesên fotografan dinihêre. Ew hinan ji wan dinase, lê hinan jî nas nake. Hin bi simbêl û rî ne. Rûyê hinan bi kene, yê hinan jî sert, hin jî westiyayî, matmayî û şaşbûyî li objektifa makîna resiman dinihêrin. Rûyê hinan mîna heyvekê spehî ye, yê hinan jî çelmisî û qermiç ye. Hinan çavê xwe girtine, mîna ko ew di xewê de bin. Hin jî li derekî d in, li dûrahiyê dinihêrin. Hin rûtirş in, hin jî rûn erm. Rûyên ji hev cihê; li pey her yekî qedereke cihê û

balkêş.Ya çav? çavên reş, çavên belek, çavên kentijî, çavên kesertijî, çavên kal, çavên pepûk. çavên jîndar û kûr... çavên kurdan, eynî mîna qedera wan.

Her tişt niha di nav van resiman de veşartiyê. Wext, dem, dewran, jiyân, serpêhatî, bûyer, pêwendî, evîn, şer, têkoşîn, êş, keser, hesret, hîs, pejn... her tiştî niha xwe veguhezandiyê nav van fotografan, xwe kiriye beşekî biçê fotografan da ko Rûşen Xanim her tiştî bibîne û bi bîr bîne. Bêguman, eger Celadet Beg weha ji nişka ve neçûya û bikaribûya romana xwe binivisiya, wî dê li van resimên ko nîşana dewreke dirêj û jiyanekê bedbext in, binihêrta. Lê mîna her daxwaz û xwesteka wî, daxwaza nivisîna romanê jî qurmiç û nîvçe ma...

– Kî dê niha pêşî li van resiman binihêre û paşê wan bîne ziman? K engê ev fotograf ê dest bi peyivînê bikin?..

Rûşen Xanim li resiman û deftera romana ko Celadet

Begê dest pê kiribû û bi tenê çend rêz nivisîbûn, dinihêre û weha difikire.

10

FOTOGRAF 1: Ceco; zarokê welatê xerîbiyê,  
neviyê Mîr Bedirxan

1

Herwekî ko hatiye gotin, meriv pêşî dibîne û dinihêre, paşê jî dipeyive û dibêje. Romana ko Celadet Begê dixwest binivîse, dikare bi vê wêneyê dest pê bike, ev wêneyê dikare bibe fotografa yekemîn a romana Bîra Qeder ê; Salut de Constantinople, Vue de Moda a Cadi-Keuy. Silav ji Constantinoplê, bergehê û dêmenek ji Modayê, li Kadiko yê. Pêşî bergeh û nêrîn, paşê gotin û qise... Sal, 1893 ye. Demsal, bihar, ji mehan Gulan, ji rojan rojê germ, vekirî û xweş e. Bihar û gulan hatine; der û ber hêşîn, dinya germ, esman gewher e. Stembol û Kadikoy di nav govenda rengan de ne. Reng bi ser ketine, dinya ji nû ve vedije. Jiyanekê nû dest pê dike.

Di bergehê de tiştê herî ber bi çav, zerya (derya) ye. Zerya di nav regekî kesk û şîn de hemû wêne rapêçaye. Tonên rengê şîn lê ne. Li aliyê dûr spiyekî qerqaş desthilat e. Li der û dorên qeraxên zeryayê tarîtiyeke qer li ser avê dixuye. Di navbera herduyan de jî hin celebên din ên rengê şîn hene. Esman çîkvekirî ye. Li cîhê ko zerya û esman bi hev re dibin yek, komên ewran çlspî ne. Lê li jorê, cîhê ko êdî ewr diqedin, esman bi rengê şîn xemiliye. Rengê spî xwe qulipandiye ser rengê şîn. Ewr di nav hev de ne, lê nerm û sade dixuyin. Ne sawa berf û baranê, ne jî tirsba û bahozê lê ne. Ew di nav spehîtiyeke zarîf de ne, mîna ko ew mizgîniya jiyana nû bi dinyayê digihînin.

Li dûr, li cîhê ko zerya û esman digihên hev, berpala girekî ko dirêjî avê bûye, xwe b i zeryayê digihîne. Qirax û ax li wir dest pê dike. Gir bilind û asê ye. Ew bi carekê noqî avê bûye, rûyê wî kevir e û mîna piyekî dirêj ê axê dixuye. Li ser gir dar hene. Ji bergehê fahm nabe ka ew çi texlît dar in, lê stûr û dirêj in. Li cîhê ko dar dest pê dikin, rengê kesk zora rengên spî û şîn dibe. Keskahiyeke bedew li rengên wêneyê zêde dibe. Keskahî hemû milê jor ê bergehê dadigire. Daristaneke xweş û bedew li wir hevaltî li zerya û esmanan dike. Jiyana merivan jî li wir dest pê dike. Ji ber ko li ser gir, di nav daristanê de xanî xuya dikin. Di ser daran re, banên

11

qesreke pir mezin dixuyê. Qesr spî ye û welê dixuye ko ew ji çend beşan tê pê. Hema di binî banên xaniyan de pencereyên dirêj û mezin dixuyin. Meriv ji penceran dikare hemû rengên roja xweş a gulana 1893-an bibîne. Digel ko qesr di wêneyê de jî pir li dûr e, dîsan jî meriv ji avasaziya wê derdixe ko qesr di dema osmaniyan de lêbûye. Mîmariya wê ne ya bîzansan e. Xwediyê qesrê jî binemala osmaniyan, sultan û şahzadeyên wan in. Qesr li ser pozê gir ava bûye û eynî mîna malbata osmaniyan, nêrevanî li erd û esmanan, dewr û dewranan dike.

Ji qesrê hinekî dûr, lê li ser eynî rêzê, çar qonax, bi gotina osmaniyan çar koşk hene. Ew bi qasî qesrê baş naxuyin, bi tenê banên wan û

hin aliyên wan dixuyin. Ew ji qesrê pir biçktir in, lê tevî vê, qonaxên spehî ne. Banên wan sor dike; bi lehîten sor lêbûne. Qonax li kêleka hev in û di nav daran re meriv dikare pencera yekê ji wan bibîne. Ew qonaxa ko pencera wê dixuye, li kêlekê ye, ji qesrê dûr e. Ew ji qonaxên din jî hinekî dûr e... Ew qonax, hebûna wê, reng û avahiyên wê, ode û meclîsên wê, bîr û bexç wê, ji bo ro mana pir girîng û pir pêwist e. Ji ber ko tovên romanê li wê qonaxê tên avêtin: Qonax, yek ji malên malbata Mîrê kurd ê Cizîra Botan Bedirxan Beg e. Lawê wî Bedrî, p aşa û sereskerê osmaniyan, tevî mala xwe tê de dijî.

Li kêleka qonaxa Bedrî Paşsayê Bedirxanî, gir bi şikêrekê xelas dibe. Tê re gewriyek derbas dibe û xwe digihîne zeryayê. Piştî gewriyê jî girekî nû ko hinekî berztir e, dest p ê dike. Lê di navbera herdu giran de, li cîhê ko gewrî xwe digihîne zerya, lengergeheke dirêj heye. Welê dixuye ko lengergeh bi qasî 100 – 120 mîtroiyê dirêj e. Li herdu aliyên lengergehê çend kelek, qayik, kod û keştiyên biçk ên bayê hene. Ji wan hinekî dûr jî keştiyeke mezintir lenger avêtiye û rawestaye. û hema li qiraxê lengergehê, du qonaxên biçûk ên bansor ko pir bi qonaxên din dişibin, dixuyin. Wan berê xwe dane zerya û piştî xwe dane gir. Girê nû û berztir jî bi daran tijî ye û li cîhê ko wêne xelas dibe, nivê qesreke mezin xuyaye.

Avasaziya vê qesrê jî mîna ya din e.

Li ser vê wêneyê tiştê herî balkêş, hebûna merivekî ye. Di wêne de, li aliyê pêş, giraveke pir biçk heye. Girav hema bi qasî bihustekê ji qirax û gir veqetiyaye. Lê meriv dikare bi hêsanî xwe bigihîne giravê. û hemû girav ji çend lat û kevirên mezin û bilind hatiye pê. Ew ne cîhê jiyîn û rûniştinê ye. Lê ji wir mîna teyrê baz, meriv dikare hemû alî bibîne. Di wêne de, merivekî li ser kevirê herî bilind ê giravê rûniştiye û li kamerayê dinihêre. Ew kî ye, çi kes e, çi dike? Meriv vê yekê ji resim nikare derxe.

12

Digel ko ew di wêne de, pir li pêş e, dîsan jî rûyê wî baş naxuye. Ew mêr e, porê wî reş, gomlegê wî spî û kincên wî reş in. Wî hinekî stûyê xwe xwar kiriye û li aliyê objektiva makîne mêze dike. Pêşî ew

li fotografkêş dinihêre û paşê jî, bi îhtimaleke mezin, weha dibêje: »Ez jî heme, ez li vir im, perçeyekî vê wêne û bergehê me...« Hebûna vî merivî wênê yekcar diguherîne; ruh û can d ikeve wênê, hest û pejna jîn û jîndariyê d ireşe ser bergehê. Di fotoya yekemîn a romana d e, hebûna merivekî weha gelek girîng e. Ji ber ko romana Bîra Qederê, tevî bergehên cud a û xweş, li ser însan ava dibe. Meriv û hebûna wî esas e.

Ev merivê ko li ser kevir rûniştiye, pişt a xwe daye girê jorîn ko qesr û qonax lê ne. Pişt a meriv, bi tamamî, ber bi qonaxa Bedrî Pa şa ye. Eger meriv xêzekê ji pişt a wî bikişîne, xêz ê rasterast xwe bigihîne qonaxê. Di qonaxê de, ji 40 zêdetir meriv dijîn. Hemû jî Bedirxanî ne. Bed irxanî, bi gotina osmaniyan Bedirxanpaşazade, pir in. Ji vê qonaxê pê ve, çend mal, xanî û qonaxên wan ên din hene. Hemû jî li aliyê rohelat ê Stembolê, li milê Anatoliyê, li Kadikoyê bi cîh bûne; li Moda, Fenerbahçe, Cevizlik, Bostanci, Mühürdar, Goztepe û Kiziltoprakê dijîn. Piştî Kurdistanê, Stembol û Kadikoy bûye welatê wan ê duyemîn.

Fotokêş kî ye? Li ser fotoyê, ev ne diyar e. Lê belê, eger kî be, ew fotokêşekî hoste ye. Li ser fotoyê hem dêmenên vekirî yên Kadikoyê, bi rengên xwe yên taybetî, hene, hem jî di navenda hemûyan de însan. Ne însan ji ber çavan direve ne jî bergeha Kadikoyê... Bergeh, perçeyekî ji xweşî û dewlemendiya Kadikoyê, tevî însanê wê, berpêş dike. Zerya Marmarayê bi pêlên xwe pişt a qirax û girên Kadikoyê mist dide. Dar û ber bi rengên xwe yên demsalan hawirdor dineqîşînin. Qesr û qonaxên Kadiko yê esaletê yekta didiyê. Bender û lengergehên Kadikoyê ko ew rapêane, mîna pencereyekê li dinyayê vedibin. Keştiyên ko li do raliyên Kadikoyê ne, ahengeke lêhatî didinê. Daristan û hêşinahiyê Kadikoy kiriye cîhê ger, geşt û seyrangehê.

Di rojêke biharê ya gulana 1893-an de, Kadikoy, taxa wê Moda û qonaxa Bedrî Paşşayê Bedirxanî, li ser resimekê weha xweş û rengîn dixuyin.

1893-an de, lez û bez û endîşe heye. Zarokek di rê de ye. Jina Emîn alî 2 Li mala Bedrî Paşşayê Bedirxanî, di rojek ji rojên gulana Bedirxan, Samîha Xanim li ber welidandinê ye. Qonax tijî meriv e. Roj xweş, dinya germ, dan êvar e. Ji axê bîhna gul û kulîlkan difûre. Zerya çîk şşin e û mîna neynikekê zelal û aram e. Li esmanan komên spî yên ewran, bi aramî, xwe dilivînin. Li dûr, du keşştîyên dirêj û stûr ên dûkelî zikê ava paqij diqelişînin û hêdî hêdî, li pey hev, derin. Dûya wan, bi giranî, ber bi esmanan hildikişe. Ro di ser ewran re li Kadiko yê dinihêre û tîrêjên wê li ser eniya pêşî ya qonaxa Bedrî Paşa şewq didin.

13

Qonax, sê qat e û li gora avasaziya osmanî hatiye lêkirin. Du qatên jêrîn, ji herdu aliyan, fireh in. Lê qata jorîn, bi tenê dirêj e. Loma, ne sê qat, lê meriv dikare bibêje ko qonax du qat û nîv e. Qata jorîn ji navenda xênî ber bi jor dibe û estetîkek e taybetî ya avasaziyê dide qonaxê. Li rûyê pêşîn ê qata jorîn pencereyê dirêj û fireh heye ko xwe şiya avasaziyê dineqîşîne. Li ber pencerê jî balkoneke, bi gotina kevn, şaneşîneke biçk heye. Ji wê derî meriv dikare hemû pêlên zerya, yek bi yek, bijmêre. Ji wir ebediyeta ewr û esman, av û zeryayê, mîna tabloyeke resamekî hoste, baş, pir baş dixuye. Bana qonaxê, ji herdu milan ve, ber bi jêr, xus dibe û bi qermîtên sor raxistî ye. Ev qermîtên sor pir xweş li rengên xênî û hawirdor hatine. Rengê qonaxê spî ye û hawirdor jî di nav rengên kesk û şîn de ye. Gava rengê sor jî li wan zêde dibe, cumbuşa rengan temam dibe û rengên herî xweş ko li ber dilê kurdan pir ezîz in, derdikevin holê; kesk, sor, zer û gewher. Niha di vê danê êvarê de, gava tîrêjên tavê li ser qermîtên banê go vend girtine, di eynî wextê de, govenda rengan e jî. Ban, bi kêranên tîkûz, bi dîwarên depîn ên qonaxê ve hatine girêdan. Ev kêran, di avasaziya osmanî de, hem pêwistiyeke lêkirinê ye, hem jî neqş e.

Mîna hemû qonax, qesr û xaniyên li doralî, qonaxa Bedrî Paşa jî xeşap e, ji max, qab, cax, kêran, karîte, spartek û stûnên textînan ava bûye. Li eniya pêşîn a qonaxê, ji nav daran, 9 pencere dixuyin, çar li

qata binî, çar li qata navîn û yek jî li qata jorîn. Caxên penceran bi hostehî hatine neqîşandin. Li ber deriyê mezin ê qonaxê derenceyek bi pênc pêlikan heye. Li herdu aliyên derî darên biçk ber bi jor dibin. Bexçeyekî biçûk û xweş ê qonaxê jî heye. Niha, li bexçê tiştê herî girîng ê romana Bîra Qederê, bîra bexçe ye. Hema li kêleka çepê xênî, di bin dareke dirêj de, bîrek heye. Bîrek ko hem ji bo romana Bîra Qederê, hem jî ji bo şêniyê malê girîng e.

Herçî aliyê hundir ê malê ye, berî her tiştî meriv divê bibêje ko 18 odayên malê hene. Du salon, mutfexeke mezin, deh odayên razanê, kitabxaneyek, odayeke xebatê, serderiyeye dirêj, dalaneke fireh, du banyo... Lê dîsan jî, digel vê mezinahî û pîrbûna odeyan, xanî têrî şêniyên malê nake. Malbata Bedrî bi xwe ji bîst kesan zêdetir e. Eger meriv mê- vanên wan ên ko hertim tên jî bihesibîne, hejmar hîn pirtir dibe. Niha, ji mehekê zêdetir e ko birayê wî Emîn Alî Bedirxan Beg jî, tevî jin û zarokên xwe, hatine û bûne mêvanên wan.

14

Belê, mêvaniyek ko ji bêgaviyê hatiye pê. Agir û şewatên Stembolê navdar in. Her roj derek, taxek, aliyekî Stembolê dişewite. Gulokên agiran bi esmanan dikevin, mal wêran dibin, malbat li kuçan dimînin. Her roj tulumbaciyên taxên Stembolê, stîl û depoyên avê li ser milên wan, bi qîreqîr, li kolanên Stembolê dibezin da ko xwe bi agirên kambax bigi- hînin û vemirînin. Lê heyhat!.. Ne agir vedimire ne jî qîre qîra tulumbaciyên bi kêrî tişteki tê. Mal dişewitin, tax kavi dibin, jiyana rojane têk dere... Berî niha bi qasî mehekê, mala Emîn Begê jî ko li aliyê Kadik oyê, Kiziltoprakê bû, şewitî. Wan jî têkber û feraqên malê berhev kirin û hatin qonaxa Bedrî Paşa.

Nivîskarê Bîra Qederê, herwekî ko tu dizanî, kitekit û detay ji bo afirîn û avakirinê gelek girîng in. Kitekit û detayên reng û bergehên ji bo resamekî, yên dengên ji bo musikejanekî, yên peyv û gotinan ji bo nivîskarekî girîngin. Belê, hê berî ko ez werim dinê, agirê Stembolê mala me wêran kiribû... Ew agir û bi gotina te, tulumbaciyên Stembolê, mîna kitekit û detayeke jî- na min, tê bîra



min jî. Li milekî ew agir û şewat, li milekî jî qîreqîr û xirecir, rû û rûçik, cil û bergên wan tulumbaciyan... Meriv nizanîbû çî bike, bikene yan bigirî... Li taxa me Kîzîltoprakê jî komeke tulumbaciyan hebû. Qîrîna wan hê jî di guhê min de ye; »Hayyyy!.. Kara babam, hayyy! Yolumuzu ke-senin haline vayyyy!.. Bu gelen Kîzîltoprak koleleri!..« Kumê wan xwar, sim- bêlê wan boq, lingên wan xwasî, pazûyê wan şidayî, ew fedakar, pêxas û berdûşên Stembolê bûn. Hebûna wan, nîşana jînê bû; li milekî axîn, girînû q îrîn, li milekî jî ken, henek û zirtîn...

Îro, di vî danê êvarê de, gava roja romantîk a biharê ya Modayê hêdî hêdî winda dibe, li qata dudiyar a qonaxa Bedrî Paşa, di odeyeke fireh de, Samîha Xanim di nav êşeke mezin de ye. Mêr li qata jêr, li salonê rûniş- tine, jin jî li jor. Zik lê giran bûye. Êşa wê yekcar zêde ye. Nefes lê diçike. Ev çî hal e!..

Ev çî hal e!.. Eger weha here, Samîha Xanim wê bimire. Danê êvarê bû êvar, êvar qulipî ser şevê, şev ber bi berbangê dihere, lê hê jî

3

zarok nehat dinê. Êşên Samîha Xanimê pir zêde bûne. Êş pêl bi pêl tîn. Nalenala Samîha Xanimê ye, ji şerma nikare biqîre jî. Ew bi tenê

15

kûr-kûr dinale. Rûşen Xanim, diya Bedrî Paşa û Emîn Beg, du jinên Bedrî Paşa û hin jinên din jî li ser Samîha Xanimê ne. Her yek, ji aliyekî

ve, dixwaze alîkarî bike. Rûşen Xanima porspî û xwedantecrube dike, nake, nikare serê zarok ji bedena dê derxe.

– Min evçend alîkarî li jinên me kirine, lê tu carî ecêbeke weha nedîtiye, ew dibêje... Li gora vê êşê û vebûna bedenê diviya zarok ji zû ve bihata. Serî dixuye, lê ber bi jêr nabe. Ev çî hal e? Tirs min ew tirs e ko

Samîha min here. aareyek divê, çareyek divê...

aare çî ye? Mêr, Bedrî Paşa, Emîn Beg û çend birayên wan ên din, di salona fireh de, li qatê jêr in

û li benda xebera xêrê ne. Lawê Emîn Beg, Sureya ko nû ketiye sala xwe ya dehan, heta berî niha bi bîskekê jî, li kêleka bavê xwe, li erdê rûniştibû û li hêviya hatina bira yan jî xwişka xwe bû. Lê gava çavên wî giran bûbûn, xizmetkareke malê ew biribû jor û xistibû xew.

Emîn Beg wê dîsan bibûya bav. Lawekî wî hebû; Sureya. Diya Sureya zû wefat kiribû. Sureya hê nebûbû du salî, diya wî bi nexweşiya seretanê ketibû û di demeke kurt de wefat kiribû. Du mehên dawîn ên nexweşiya wê Emîn Ali Beg gelekî êşandibû. Diya Sureya ko Emîn Ali Begê jê ewçend hez dikir, li ber çavên hemûyan, bi êş û janeke mezin, vedimirî û dimir. Ne Emîn Ali Begê, ne jî kesekî din, nikarîbûn tu tiştî bikin. Di ro-

jên dawiyê de, diya Sureya bi qasî mistekê mabû. û gava wê wefat kir, Emîn Ali Beg bi rojan li şîna wê rûnişt, bi mehan pê êşiya û di şevên tarî yên zivistana Kadikoyê de, bi dizî, ji bo delaliya xwe giriya. Diya Sureya jineke bedew a çerkez û ji malbateke navdar a arîstokratên osmaniyan bû. Ew, evîna yekemîn a Emîn Ali Begê bû. Wan hê di xortiyê de hevûdu naskiribûn. Di nav daristan û bexçeyên Moda de, ew p êşî ji dûr ve, bi çavan peyivîbûn, paşê jî dest di destan de. Hingê mirin tu carî nedihat bîra wan.

Piştî zewacê lawekî wan ê mîna topa zêr jî çbûbû. Pêşerojê tiştên nû, xweş û serfiraz waadî wan dikir. Lê di wê dema ko ne mumkin bû ko wan bîr bi mirinê bibirana, mirin hatibû...

Bi dû mirina yara wî ya dil û can re, Emîn Ali Beg dil tunebû ko bizewiciya. Lê lawê mîrê gorbihu şt ê kurdan Bedirxan, yek ji serokên herî girîng ên kurdan wê çawan mala xwe bê jin bihîşt? Niha lawê wî jî hebû, na, nedibû... Xwişkên wî Melek, Ayşe û Sariye û bi taybetî jî dapîra wan hemûyan Rûşen Xanim ketin qirika wî da ko ew bizewice. Dîsan zewac... bi kê re û çawan? Lê li ser gotin û israren »jinên malê«, ew hêdî hêdî dîsanket ser riya zewacê. îcar jî dîsan bi yeke gelekî nas re; Samîha. Samîha ko

li ber destê diya wî mezin bûbû û ji diya wî re cariyetî dikir. Samîha ko mîna çilkeke zêr û dilopeke av bû. Samîha ko dilê wê nerm, heşê wê xurt û wîcdanê wê tam bû.

Her çi tişt û kesê xweş û rind e, ew muqedes e. Ev, yek ji qayideyên min ên jînê bû. Xweşahî, spehîti û bedewî divê felsefa jînê be. û xweşî û rindî divê bi xweşî û rindî bête zimên... Eger ez weha difikirîm û dijiyam, ez bawer im, tê de tesîra diya min pir bû. Diya min abîda xweşî û rindiyê bû ko bi gotî- nan naye saloxdan. Ew jî mîna dêmariya min a rehmetî ko min nedît, çerkez bû. Lê tişteki diya min ji dêmariya min zêde bû; diya min bi kurdî jî dizanîbû û li malê bi kurdî dipeyivî û ez vê yekê jî bibêjim; kurdiya diya min ne kêmi kurdiya metên min û dapîra min bû. Herwekî tu jî dizanî, be- dewiya çerkezan bi nav û deng e. Ew hemû bedewî hatibû û li ser rûyê diya min diçirûsî. Di jînê de, meriv rastî gelek rûyan dibe. Piraniya wan ji bîr dibin, lê hinên wan di bîr û heşê meriv de, her û her, dimînin. Rûyê diya min, yek ji wan rûyan bû ko mîna siya meriv, hertim, bi merivan re bû. Rûyekî gulover, spî, xweş lihevhatî û bihîstiyar...

Lê niha halê Samîhayê ne tu hal e. Jê re çare divê... Rûşen Xanim ji derencên textîn û neqîşkirî ko di navbera herdu qatên qonaxê de ne, hêdî hêdî peyayî jêr bûye û niha li salona mezin a qonaxê, li nik »mêran« e. Mêr divê çareyekê bibînin. çavên mêran bi endîşe û meraq li Rûşen Xanimê dinihêrin. Gelo çi bû, çima zarok nayê, digel ko evçend wext derbas bû? Rûşen Xanima westiyayî û bêxew nap eyive, bi tenê bi çavan li civatê mêze dike û dîsan bi çavan bang li Bedrî Paşa dike. Herdu bi hev re, Rûşen Xanim li pêşî, Bedrî Paşa li pasî, derbasî mitbaxa mezin û fireha kêlekê dibin. Maseyeke xwarinê ya dirêj û li doralî jî donzde kursiyên rûniştinê, li aliyekî mitbaxê ne. Mase û kursî ji darê gûzan çbûne û rengê wan, rengê qahwê ye. Rûşen Xanim bi destê Bedrî Paşa digire û bi hev re derin li ser herdu kursiyên li ko şa masê rûdinin. Stêrk, ji p encereyên fireh ên mitbaxê, ronahîyeke qels direşînin hundirê mitbaxê.

– Yadê, ev çi hal e, xêr e? aima zarok weha bi derengî ket? Bedrî Paşa dipirse.

– Kurê min, min heta niha pîrikiya bi dehan zarokên malê kiriye, lê min ecêbeke weha nedîtiye. Ji êvarê de ye ko zarok nayê xwar. Em dikin nakin, nikarin zarok bikişînin. Heke hinekî din weha dewam bike, em ê Samîha reben winda bikin... Divê doxtorek were û alîkarî bike. Wekî din

17

çare nîn e. Min nexwest ji Emînê xwe re bibêjim. Heke min jê re bigota, wî ê bigota na. Tu jê re bibêje û wî ji bo doxtor îkna bike. Hûn çi dikin bikin, zû doxtorek bînin.

– Yadê, di vê nivê şevê de, em ê doxtor ji ko bibînin. Tu dizanî, em ji bajêr gelekî dûr in.

Rûşen Xanim gotina dawîn, bi dengê sar û qetî, dibêje; – Lawê min, ma heke çare hebûya, min doxtor dixwest? Rast e, em ji bajêr gelekî dûr in, lê erebe li ber derî ye, ji seyisê xwe re bibêje, bila ew hespan bîne û bi erebê ve girê bide... Hûn divê xwe bi doxtorekî bigihînin.

4

Me xwe bi doxtor Esad Paşa gîhand. Xwedê jê razî be, wî yeka me nekir dudo.

Gava Bedrî Paşa û bijîşk Esad Paşa dikevin hundir, aliyê salonê, Bedrî Paşa weha dibêje. Emîn Beg û kesên din jî radibin û xêrhatinî li Esad Paşa dikin: »Hoş geldiniz, buyurun, oturun.« Ew kursiyeke fireh a rûniştinê didin Esad Paşa. Lê Esad Paşa rûnane, destê xwe yê rastê davêje riya xwe ya dirêj û spî, li dora xwe û li Bedrî Paşa û Emîn Beg dînihere û bi ken dibêje,

– Hayir, oturmayaım. Sa

đolun. Elbette Bedri Paşa ve sizleri kiramazdim... Ancak bildi

điniz gibi, ben goz tabîbiyim. Ama elimden gelen i yapaca đim...

Esad Paşa ko bi eslê xwe arnawid e, tevî mal, zarok û neviyên xwe, li Kadiko yê, Modayê rûdine. Piştî ko seyis hesp û erebe hazir kiribû û de- riyê erebê vekiribû, Bedrî Paşa, birayê xwe yê herî biçk Murat

jî girtibû ba xwe û ew bi hev re çb ûn mala Esad Paşa. Esad Paşa ne bijîşkê zarokan bû ne jî aletên wî yên bijîşkiya zarokan hebû. Lê wî tikaya Bed rî Paşa venegerandibû. Ew bi hev re pêşî çbûn nexweşxana HaydarPaşşayê da ko hin alet û firaq werbigirin u bi dû re jî, bi lez, hatibûn malê.

– Hemen işe koyulalım... Hastamız nerede?

Bi van gotinên Esad Paşa re, Rûşen Xanim rê nîşanî wî dide û ew bi hev re derdikevin qata jor, odeya Samîha Xanimê. Jinên ko li odê ne, xwe didin alî. Textê razanê ko Samîha Xanim li ser e, li ber pencereyekê ye. Li herdu aliyên text du maseyên dirêj ên text hene ko ji herdu aliyên ve xwe bi dîwêr digihînin. Li ser wan jî du çirayên mezin vêketîne. Li ser dîwarê kêlekê lewheyê mezin heye û tê de bi d estnivîseke gelekî bedew, bi ere

18

bî, Bismîllahî Rehmanî Rehîm hatiye nivisîn. Destnivîs neqîşkirî ye û di- yar e ko ew ji destê xetatekî hoste derketiye... Esad Paşa tê ser Samîha Xanimê û lê dinihêre. çavên wê girtî ne. Diranên wê yên jorîn li ser lêva wê ya jêrîn in û ew gez kiriye. Rûyê wê yê spî yekcar bûye mîna xwelî û jê êş û jan dixuye. Bi tenê ji xwîdana ser enî, meriv fahm dike ko Samîha Xanim dijî. Esad Paşa destê xwe dide ser enîya wê. Enî, mîna cemedê, sar e. Esad Paşa, bi destê xwe, bi zehmetî, çavê Semîha Xanimê vedike.

Hingê, ji nişkê ve, bedena wê, mîna ko ew ketibe ber zelzeleyekê, pihêt diheze û nalîneke kûr pê dikeve. Pêlên hezînê li pey hev û pir xurt tînin. Esad Paşa, bi carekê, li Rûşen Xanimê û jinan vedigere:

– aabuk, çok çabuk, sıcak su, bez vesaire getirin, çabuk... Jin, hema bi lez, jê re du misîn ava germ, satileke ava sar, leganeke mezin, hin pêşgîr tînin. Ew bi lez destên xwe duşo û dîsan dere ser Samîha Xanimê.

Feylesofan weha gotiye; rû, ruh û giyanê bedenê ye. Tiştê ko meriv li ser rû dibîne, haletê ruhiya bedenê ye. Rû, nîşana fikir, hizr, pejn, hîs, gumanên dil û mêjî ye. Tu dikarî van hemûyan li ser rûyekî

bibînî û bixwînî. Ma me kurdan jî weha negotiye; li rû binihêre, merivê xwe binase.

Di destê wê sibê de, li ser rûyê diya min Samîha Xanimê jî mirin hebû. Bi tenê mirin. Mirinê hê hingê mohra xwe lê xistibû. Ew êş, jan û zehmetiya berbanga wê sibê hem nîşana jîneke nû hem jî ya mirinê bû. Di berbanga sibeheke bihara 1893-an de, jîn û mirin ketibûn nav hev. Tu kesî nikarîbû ew ji hevûdu veqetandina. Cezbê mirinê bi ser herkesî de hatibû. Kesî nikaribû tovên jiyane tê de bidîta...

aaxa dunya ronî dibe û tav bi tîrêjên xwe yê pêşîn mizgîna rojeke nû dike, Esad Paşa, Rûşen Xanim, Melek Xanim û du cariyê ji derencên qa- ta jor peya dibin. Di hembêza cariyekê de, di nav pêşgîreke spî de tiştê heye. Pêşgîr di nav xwîna sor de ye. Esad Paşa, Rûşen Xanim û Melek Xanim ber bi salonê, herdu cariyê jî ber bi deriyê derve derin.

Gava Esad Paşa û yê pê re dikevin salonê, Bedrî Paşa û Emîn Beg ji kursiyên xwe radibin. Ji kesî deng dernakeve. Bira û biraziyên din hemû çne, li salonê bi tenê Bedrî Paşa û birayê wî Emîn Beg mane. Yê nû hatî jî li kursiyên kêlekan rûdinin. Hemû westiyayî ne, ji rûyên wan xemgînî dixuye.

– Aci kahveniz var mi? Sabah sabah aci kahve iyi gelir.

19

Esad Paşa qahwa tahl dixwaze. Di destpêka sibê de, qahwa tahl baş û xweş e, ew dibêje. Xeberên wî hem xweş, hem nexweş in. Emîn Beg, destê wî li ser riya wî, bi hizr li Esad Paşa guhdarî dike.

– Samîha Hanimi gü bela kurtardik. Ancak çocu ðu kurtaramadik. Hacmi çok büyüktü. Zorla ana karnından çikardik. aok zor oldu. Ölü do ðdu...

Rûşen Xanim gotina Esad Paşa didomîne. Semîha, Semîha delal û reben, di nav hêlekana mirin û jînê de çend caran çye û hatiye. Wan bawer nekiribûn ko ew ê xelas bibûya, şikur ji Xwedê re ko ew xelas bûye.

Herç zarok e, wê hê zarokekî ewçend mezin nedîtibû û zarok kurekî qerqaşî bû.

Emîn Beg bi tenê li wan guhdarî dike û difikire. Ew çî bibêje û hîs bike?

Samîha ji mirinê xelas bûye. Lê lawê wî miriye. Wî navê lêwik jî hazir kiribû. Eger zarok kur bûya, navê wî dê Celadet bûya, na eger ew keç bûya, navê wê dê Meziyet bûya. Lê ew çî bike?.. Mirin û jiyan bi hev re

hatibûn.

5

Mirin û jiyan bi hev re hatibûn. Samîha Xanim li jorê, qata diduyan, razaye. Perçeyê beden û jiyan wê, zarokê mirî, li jêr, li kêleka bîrê ye. Cariye zarok, di nav pêşgîr û pêçekêkî bi xwîn de, danîne ber devê bîrê da ko wî bişon û tevî xanimên malê, veşêrin. Ew li der, bêruh û bêpejn, tenê, li kêleka bîreke sar, dirêj bûye.

Pariyeke zarok, misteke can... Hatin û çûna wî bû yek. Ji qonaxê deng dernakeve. Mala mezin, di nav xewa sibê de, bédeng, li neheqiyên jiyanê difikire. Kî dê zarokê mehrûm bibe, wî bişo û ji xwîna jiyanê paqij bike? Kî dê kefenekî spî û biçk li bedena wî ya biçk rap êe? Bêyî hêstirên çavan, kî dê bikaribe li ser wî melayika biçk, bilorîne û stranên şîne bibêje? Kî dê wî bi tamamî ji jiyanê bi dûr xîne û bixe bin axa re ş û sar? Kî dixwaze pergî rûyê sar ê mirinê bibe, xwestekên mirinê qeb ûl bike, stûyê xwe li ber mirinê xwar bike, ji xwe re nebe xweyî û bide ber sistiyê? Kî? Jiyan û zehmetiyên jiyanê li aliyekî. Lê ev mirin, mirina ko dora romana rapêaye. Mirina ko berî jiyanê hatiye û zarokekî nûbûyî dixwaze.

Mirina ko rêzika dinyayê digêrîne, niha li mala Bedrî Paşa çerx dibe. Rûşen Xanim, Melek Xanim, Bedrî Paşa û Emîn Beg jî çûne odayên xwe yên razanê. Bi westa şevê û sawa mirinê, ew dixwazin çavên xwe nerm bikin. Bi tenê çend cêriyên malê li piya ne. Yek li ber serê Samîha Xanimê

20

rûniştiye, yek li jêr têkberên salon û odeyan dide hev, yek jî li mitbaxê avê germ dike, ji bo zarokê li ber devê bîrê.» Ji bo zarokê li ber devê bîrê«... Hin gotin û peyv hene ko tê de jînek, um- rek veşartiye. aaxa meriv li wan hûr dibe, umrekî dirêj, mîna neynikekê, li merivan dinihêre. Heye ko haya te jê tune be, lê di gotina te ya jorîn de umrê min veşartiye. Peyva bîrê û bîrên ko di hin gehînekên jîna min de bûn pardarên qedera min, hê wê roja biharê, li ber bîra qonaxa mamê min Bedrî Paşa, xwe bi kûrahî bera nav rehên jîna min dan. Jîna min a ecêb, bi awayekî ecêb, bi wan dest pê kir û bi wan xelas bû... Bîra mala Bedrî Paşa ko li kêlekê jîn û mirin di nav şerekî bêeman de bûn, bîreke pir xweş bû. Doraliyê wê bi qasî pênc bihustan, mîna dîwarekî, bi qermîten sor hatibû lêkirin. Devê wê zêde ne fireh bû. Ew ne kûr bû jî. Di nav bîrê de, bi dîwaran ve, pêbaskên wê hebûn. Meriv dikarîbû bi wan pêbaskan daketa nav bîrê. Ava wê hinekî şor û hertim hênik bû. Dara behîvan ko li kêleka bîrê bû, xweşiyê yekta dida bîrê. Gava meh dibû adar û kulîlkên spî yê darê dibişkovîn, di bin dara spî de bîr dibû mîna bergehê ji çîroka »Hezar û şevekê...«

Cêriya li mitbexê, ko eslê wê îtalî ye, straneke îtalî ya zîz li ser lêvên wê, hêdî hêdî, karê xwe dike. Wê ji qata herî jorîn, ji oda binê banê ko ji bo dirûn û hûninê ye, cawekî dirêj ê spî aniye. Ev caw wê bibe kirasê mirinê, yanê bibe kefen û bedena biçk rapêe. Av li ser argûnê germ dibe. Gelo zarok wê li ko were şuştin? Mal, mala misilmanan e. Adet û ûsil divê baş bi cîh bîn. Lê kî dê bi cîh bîne? Cêrî dê çima serê xwe bi van pirsiyaran biêşîne. Ji ber bextê rind, Rûşen Xanim, stûna mala Bedirxaniyan li vir e.

Bêguman, ew ê her tiştî, bi rê xîne... Cariye dere ser beroşa li ser êgir û li avê dinihêre. Na, av hê germ

nebûye. Gelo av ne kêmbê? Cariye satila ber argûnê digire û dere derve da ko ji bîrê avê bikişîne. Dinya êdî ronî bûye. Ji dûr dengê pêlên zeryayê, ji ser darên bexç jî dengê çivîkan tê. Bayeke sivik hêdî hêdî pelên daran dilivîne. Rojêke nû ya bûyerên însanî dest pê kiriye. Zarokê mirî di nav paç, xawlî û pêşgiran de, li wir, li ser



qermîten ko li dora bîrê hatine raxistin, dirêj bûye. Jiyan çiqas ecêb e!.. Gelo vî mehrûmî, hema bi qasî kêlîkekê be jî, jiyan dît û hîs kir? Gelo rûyê wî çawan b û? Ji ber xwîna boş, kesî ne rûyê wî ne jî serçavê wî dîtibû. Niha, piştî bîskekê, gava ew vî mehrûmî bişon, Rûşen X anim ê, îlam, li rûyê wî binihêre.

21

Lê ew çi ye! Dengê tê. Dengê zarokê tê. Dengê zirav ji zarokê mirî tê guhê cêrî. Ev çi ye!.. Cêrî, li kêleka bîrê, di cîhê xwe de, mat dibe. Na, ne rast e. cêrî, ji xofan, hinekî xwe ji ber bîrê vedikişîne. »Mama mia, mama mia...« Ma ev ne cin bin? Sîhirên cin û periyên li van deveran navdar in. Ev ne lîstikeke periyên be? Ji dûr ve, ew dîsan, bi dîqet, li pêka zarok dinihêre û guhê xwe didiyê. Deng e, deng tê... belê, deng tê... Ew vedicinîqe.

– Signore, signori, signore, signori!..

Cêrî ji nişkekê ve, bi tirs û qîrîn, direve hundir. Cin in, cin hatine. »Signore, signore!« Cariyên din li mitbaxê, li ser serê wê dicivin. Yek jiwan tasek av tîne û didiyê. Ew diheze û matbûyî li cariyên dora xwe dinihêre. Murat Beg ko li qata jêrîn razayî bû, bi deng û qîrînê radibe û bi heyecan, pîcema lê, tê mitbaxê.

– Ne oldu, ne var? Franceska, ne oldu?

Ew bi tirkî ji cêriyan û cêriya ko diheje dipirse. Lê cêrî nikare bipeyive.

6

Ew bi tenê, bi tiliyan bexçe nîşan dide û dibêje: »Piccola, piccolo..« Mio piccolo, mio picollo. Cêrî, Rûşen Xanim, Melek Xanim, cariyên din li ser serê zarok in û wî dişon. Hêdî hêdî, bi dîqet. Wan zarok anîne hundir, mitbaxê. Tiştê nebûyî qewimiye; zarok dijî.

Ew di nav xwîna de ye û hê jî ji serê wî xwîn tê. Lê ew dijî. Di pêveçûna jiyan û mirinê de, jiyan bi ser ketiye. Li q onaxa Bedrî Paşa, di roja nû ya biharê de, bêdengiya mirinê, bi carekê, qulipiye ser dengên jiyanê.

Samîha Xanima ko ji mirinê xelas bûye, niha dibihîse ko lawê wê jî ji mirinê xelas bûye. Bask nîn in ko ew pê bifire. »Yarebî, şukur,

şukir ji te re. Heke tu nekujî, nakuji», ew dibêje. Ew nikare ji cîhê xwe bilive û dakeve jêr, lê ji cêrî dixwaze ko ew werin û her gav xeberên lawê wê jê re bibêjin.

Kêf, kêfa Rûşen Xanimê ye, jê re payan nîn e. Di vî umrî de, wê dê ev roj û ev ecêb jî bidîtina! Berî niha bi demeke kurt, ew bi keserkûrî çûbû oda razanê û ketibû nav cîhê xwe yê ko li erdê raxistî bû. Wê dê zarokê mirî bişuşta, kefenê spî lê rapêa, li serê bixwenda û ew bikira nav gorê û axa reş li serê bireşanda. Lê niha zarok hatiye, ji mirinê vegeriya û hatiye. Perda reş a mirinê rabûye. Di roja ronî de, jiyana ronî dest pê kiriye.

Rûşen Xanima ko umrê wê li ser 80 salan e, lê hê jî li ser xwe ye û di tevgerên xwe de xurt e, bi hêdîka, bi xawliyeke spî ya şil, xwîna zarok jê paqij dike. Zarok digirî, qîreqîr dike û xwe dilivîne. Bedena wî, li gora

22

zarokê nûbûyî, mezin e û bejna wî jî dirêjtir e. Rûşen Xanim rûyê zarok paqij dike. Rû hêdî hêdî derdikeve holê. Porê wî reş, birûyên wî geş, rûyê wî gilover e.

Li vî pozî, li vî difnî fekin, Rûşen Xanim bi ken dibêje. Poz, mîna pozê beranan e. Xwedê star bike. Enî, mîna eniya çiyayê Herekolê ye. Xwedê bihêle, ew tevde li bapîrê xwe rehmêtî Bedirxan Beg çûye, tevde kalik e.

Min dapîra xwe Rûşen Xanim, bi gotina te »stûna malbata Bedirxaniyan«, hezar mixabin, nas nekir. Bîr û hafiza meriv heta katekê ye. Piştî wê êdî per- da nezaniyê ye. Heta katekê, zaroktiya min tê bîra min. Lê, ne dapîra min. Bi dû bûyina min re ew dîsan vedigere şamê, nik keçên xwe û li wir jî dere rehmêtê. Wê li kêleka mêrê wê Mîr Bedirxan defn dikan... (Jixwe li gora gotinan, gava ez tîm dinê, ew bi mêvanî ji şamê hatiye Stembolê û de- mek jî ji bo min li Stembolê maye.)

Tu dizanî, di jîna xerîb de, meriv hene ko çêyîyeke mezin li te kirine û mohra xwe li jîna te xistine. Lê tu wan nas nakî. Tu dikî, nakî, tu nikarî xwebi wan bigihînî û wan binasî û bi awayekî ji bin çiyaya wan

derkevî. Tu bi wan dizanî, li wan difikirî, lê nîkarî wan bibînî. aêyiya wan dibe hesreteke xedar û bi canê te dikeve. Hesret gav bi gav te, bedena te, can û ruhê te, mêjî û dilê te vedigire. Hesreta dîtina dapîra min jî, hesreteke weha bû; wê ez vegirtibûm. Di her gava nû ya jîna min de, wê hesretê riya min li ber min rast dikir. Min li gora wê gav davêt. Bav û diya min, mam û metên min bi dirêjî behsa wê û zimanê wê yê şêrîn dikirin. Li gora wan, tu kes mîna dapîra min xweş û zelal bi zimanê kurdî nepeyiviye. Eger ez pêşê bi xurtî li ser zimanê kurdî hûr bûme û min bi kurdî nivisiye, bawer bike, tê de para hesreta dîtina dapîra min pir e.

Rûşen Xanim zarok baş dişo, xweş dipêe, serê wî yê birîndar girê dide û wî bi cariya îtalî re dişîne cem diya zarok Samîha Xanimê.

– Fransê, lêwîk bibe nik diya wî, bila ew şîr bideyê. çavreşê min birçî ye, ew dibêje û tevî Melek Xanimê vedigere salonê.

Emîn Beg û birayê wî yê biçk Murat li salonê rûnîştine. Cixare di destan de, rûyê Emîn Beg dikene. Gava ew Rûşen Xanimê dibîne, radibe ser piyan û ber bi wê dere.

– Yadê, çavê me ronî, lingê te bi xêr hat, Lawîk jî xelas bû, ew dibêje.

– Emînê min, tu lêwîk bibînî, pariyekî şekir e; çavreş, pozberan, enîvekirî ye. Ew eynî bavê te rehmêtî Bedirxan Beg e.

23

– Yadê, helbet lawê min ê li bapîrê xwe were. Celadetê min neviyê Mîr

Bedirxan e. Ew ê dewsa bapîrê xwe bigire.

– Te got çî?

Rûşen Xanim, bi heyirî, ji Emîn Beg dipirse. Ji ber ko wê tu carî ev nav

nebihîstiye. Navê ko dê hertim di romana de derbas bibe, cara yekemîn, hingê bi ziman dibe.

– Celadet, Yadê. Navê neviyê te dê Celadet be. Yanê xurtî û bawerî.

Yanê li hember mezinahî û serdestiyê xwe ragirtin... Ji mêj ve bû ko min navê wî danîbû. Ew li welatê xerîbiyê hatiye dinê, lê neviyê Mîr

Bedirxan

wê bibe tîmsala xurtî û baweriya bapîrê xwe. Tu bi vê bawer be, Yadê.

– Cedad, Cedet... Ceced... Te got çî, navê wî çî bû? Rûşen Xanim nikare navê lêwik bi lêv ke. Emîn Beg bi destê Rûşen Xanimê digire û wê dibe li ser kursiyekê dide rûniştin. Ew destê xwe dibe

riya xwe, pê dilîze û bi ken dibêje,

– Yadê tu pir westiyayî, hinekî bîhna xwe veke û... Celadet, Yadê, Celadet.

– Cela... na, ez nikarim bibêjim, zimanê min lê nagere. Heyra ez ê jê re

bibêjim Ceco. Cecoyê min...

24

FOTOGRAF 2: Bedirxanî; mîrên kurdan, xwedanşan, lê bindest

1

Ev fotograf di wan salan de ko êdî gotinên »Ceco, Cecoyê min« li ser lêvan in, tê kişandin. Sal 1895 e, ji deman payiz e. Li hemû Kadikoyê du fotografkêşên hoste hene; Th. Servanis û R. Xendamian. Yê yekemîn cihû, yê duwemîn ermen e. Mîna her tiştê Kadiko yê, fotografkêşî jî di destê endamên milletên têkel de ye. Fotograf û fotografkêşî, hem li Stembol û Kadikoyê hem jî di nav hemû tixûbên dewleta Osmanî de, nav û ti9 99tên nû ne. Nav û tiştên nû ko pir bala xelkê, lê bi taybetî jî pir bala giregir, dewlemend û Paşşayên dewleta Osmanî dikişîne. Berê lewhe û wên e hebûn, niha jî fotograf. Berê wênekêş û resam radihiştin pênûs û firçan û li ser kaxiz û cawan bi rojan, mehan, dixebitîn da ko resimek, wêneyek bînin pê. Lê niha fotografkêş, bi alîkariya makîna xwe, di nav kêliyê de, xebateke demeke d irêj tîne pê. Meriv, rû, çav, dev, nihêrîn, awir d i nav bîskekê de direşin ser kaxizên taybetî yên spî û dibin nemir.

Fotograf nemiriyê direşîne ser kaxizan. Fotograf rehetiyêke nû, bi riyeke pir erzan, dide merivan. Meriv çî jî bike, çiqas hoste b e jî,

resim tu carî bi eslê xwe namîne. Hin tişt, hin xêz, hin reng yan kêman, yan jî zêde. Lê fotograf, ev îmkana nû, ne welê ye; her tişt mîna eslê xwe ye.

Fotografkêş makîna xwe datîne ser sêpiyê, kêlîkê ji çavika makînê, li kesê ko dixwaze bibe nemir dinihêre, dibêje »dîqet« û pê li qumçika makînê dike. Ew kurte-dema ko fotografkêş pê li qumçikê dike, êdî kurte-demek e ko tu carî ji bîr nabe; fotograf hatiye kişandin, kopiyek ji eslê wê hatiye pê û ya girîng, ew kopiyê dê her û her bimîne. Ne wext û herikîna wextê ne jî mêjî û kalbûna mêjî êdî dikare wê kurte-demê bide jibîrkin.

Kopiya ko eynî mîna eslê xwe ye, dê li ser dîwaran, di nav b êrîkan de, di nav kaxiz, defter û kitêban de bîn parastin. Meriv dê car bi car, dem bi dem, li wan binihêre û kesê li ser fotografê bi bîr bîne. Ew kes êdî ne wînda ye, bêdeng û bêziman be jî, ew her û her heye.

25  
»Fotograf û fotografkêşî şoreşeke yekta ye.« R. Xendamian, fotografkêşê yekta yê Kadikoyê li ser qerteke danasînê ya hunera xwe, bi fransîzî, weha nivisiye: şoreş... Ew, ne neheq e. Hem wî hem jî fotografkêşê din ê Kadikoyê Servan is xwendina xwe li Fransê, Parîsê kirine. Haya herduyan jî ji guherînên cîhanê, dîtinên nû yên civakî û pêşketinên teknîkî heye. Herdu jî baş pê dizanin ko dinya ketiye nav heyameke nû

ya guherînên welê ko her yek bi serê xwe şoreşeke mezin e. R. Xendamian li Parîsê hîn bûye ko fotograf di warê pêşketina merivahî û teknîkê de şoreşeke mezin e. Şoreşeke mezin li hember wext, herikîna wextê, dewr û tarîxê... Fotografek ko îro tê kişandin, sibê û dusibê jî dimîne. Fotografekko li vir tê kişandin, li her aliyê dinê nemiriya xwe diparêze û didomîne.

Ji ber vê yekê ye ko R. Xendamian, li ser eynî qerta danasînê, weha didomîne; »ev şoreşa mezin a pêşketinê ko sala 1839-an keşif bû, niha hatiye nik me Stembol û Kadikoyê. Eger hûn dixwazin, ev şoreşa li ser zimanan alîkarî li we û nasên we bike, kerem bikin... fotograf wê we bike nemir...«

Stembolî, bi taybetî jî Kadikoyî hê nû bîr bi nemir iyê û hunera fotografê dibin. Ew yek bi yek, rêz bi rêz derin atolyên Servanis û R. Xendamian û xwe dikin nemir. Ew fotografên xwe nî şanî hev didin, wanmîna kitêbeke muqedes di paşilên xwe de vedişêrin û bi serbilindî, car bi car, li kopiya xwe dinihêrin. Şoreşa nû x we gîhandiye Stembolê û pêl bi pêl fireh dibe. Meriv bi hêsanî dikare bibêje ko eger di destpêka salên 1890-an de, li hemû Kadikoyê, du kesên ko şixulê wan herî baş be hene, ew jî Theodore Servanis û Rafael Xendamian in. Belê, pêşnavê wan Theodore û Rafael e. Lê belê tu kes wan bi pêşnavê wan bi nav nake, ew monsiuer Servanis û Xendamian in. Atolyên wan hertim tijî ne. Paşa, zabit, dewlemend, nivîskar, rojnamevan, beg, jin, zarok, pîr û kal hemû tên, xwe didin hev, li hember makîna reş a ecêb rûdinin, li qulika biçk dinihêrin û tiştêkî pir nû û xweş li jiyana xwe zêde dikin; fotograf.

Monsiuer Servanis û Xendamian hem hevalên hev in hem jî raqîbên hev. Bala wan pir li ser xweşî, zelalî û dewlemendiya fotografan e. Kî di van waran de bi ser keve, ew, bêşik dibe hoste û yekta. Li gora gotinan û xweşî û mezinahiya atolyê û neqşên qertên fotografan, meriv dikare bibêje ko R. Xendamian hîn bêtir biserketî ye. Li pişt qertên herduyan jî hin neqş û wêne hene. Li pişt qertên Servanis, stêrkeke 99 9eşkoşe heye. Stêrk li herî jor e. Tîrêjên stêrkê bi xetên xuya ber bi jêr dib in. Tîrêjên ko ji zikê stêrkê derdikevin, her ko dere ji hev vediqetin û navbera wan fireh dibe.

26

Ji nav tîrêjan nivîsarek bi tîpên erebî derdikeve. Li vir bi tîpên erebî weha hatiye nivisîn; Fotografhane-i T. Servanis – Kadikoy. Di binê vê nivîsarê de, îcar ji jêr ber bi jor, bi tîpên latînî weha hatiye nivisîn; Th. Servanis, Fotografhe – Cadi– Keuy. Herçî qertên Xendamian in, li pişt wan, berî her tiştî, du zarok dixuyin. Zarok li hember hev in. Umrê wan, mîna Celadet, lawê Emîn Beg, ne zêdeyî du salan e. Yek ji wan tazî, yê din bi pêşgîrekî xwe dipêe. Li ber zarokê tazî

makîneyeke fotografê, li ser sêpiyê, heye. Destên zarok li ser sêpiyê, çavê wî li ser qulika makînê ye.

Ew haziriya kişandina fotografê dike. Li hember wî jî, zarokê din, bi rûkenî, li kamerayê dinihêre. Kêfa vî zarokê pir li cîh e, wî pişt a xwe daye stûneke xweş a kevnar, bi destan herdu milên pêşgîrê girtiye, piyên xwe di ser hev re birine û bi ken li hember dinihêre; sûretê wî dê, niha, li ser kaxizan derkeve, ew ê, di nav kêlîkê de bibe nemir. Ev herdu zarok, bi hev re, wê kurte-dema ko şo reşa nû dike nemir, dijîn. Doralîyê zarokan jî bi pel û gulan rapêayî ye. Li ser serê zarokan jî, bi tîp ên erebî yên mezin, Fotografhane-i R. Xendamian – Kadikoy hatiye nivisîn. îcar li ber lingên zarokan jî, bi tîpên mezin û neqîşkirî yên latînî û bi fransîzî Photographie, Raphael Khendamian – Cadi–Keuy hatiye nivisîn.

Ji van neqş û nivîsaran jî baş dixuye ko R. Xendamian hîn bêtir hosteyê karê xwe ye. Motîvên zarokan kêf û rehetiyekê d idin, nivîsar xweş xuyane û neqîşkirî ne, doralî ji bîr nebûye û lihevhatî ye. Di ser de jî R. Xendamian fotografên ko reş û spî ne, bi pênuşîne taybetî xweş reng dike. Pêwendiya R. Xendamian û ro mana li vir dest pê dike, R. Xendamian hem fotografkêşekî hoste ye, hem jî ew dostê malbata Bedirxaniyan e. Ji mêj ve ye ko pêwendiya Bedirxaniyan bi ermenan re xurt e. Bedirxanî ermanan mîna cîran û pismamên xwe dibînin. Li hem- ber ermenan, ew xwediyê germahiyeke boş in. Kadikoy, warê milletên têkel, niha bûye stariya kurdan û ermenan jî. Li wir bi qasî kurdan, ermen jî hene.

Mala R. Xendamian nêzîkê qonaxa mamê Celadet Alî şamîl Paşa ye. Ew qata yekemîn wekî atolye û herdu qatên din ên xênî jî wekî mal bi kar tîne. Fotograf a duwemîn a romana ji destê R. Xendamian derketiye. Wî ew kişandiye. Fikra kişandina vê fotografê jî, dîsan, ya wî ye. Mîr Bedirxan ko binemala Bedirxaniyan navê xwe jê digirin, hem li Stembolê, hem jî di nav tixûbên fireh ên dewleta Osmanî de navdar e. Ew bi gotin, jîyan, kirin, serpêhatî û serhildana xwe tê nasîn. Li ser wî çrok hatine gotin, stran çbûne, pesn lêbûne. Dîfn û bîfîla wî, enî û porê

wî, dev û lêvên wî, poz û çengê wî, çav û birûyên wî, bal û bejna wî bûne rîzîkên gewher ên dengbêj û çrokbêjan. Lê belê, ne resim û wêneyek ne jî lewhe û bergehêk jê maye. Kesî bîr nebiriye û lewheyêke wî çênekiriye.

Kesî di salên 1850 û 60-an de fotografêke wî nekişandiye. Ew bi tenê bûye lehengekî navdar ê serpêhatî û destanan... Ji herkesî bêtir jî R.Xendamian, ji ber karê xwe, bîr bi vê kêmaniyê dibe û li ber vê kêmaniyê dikeve. Loma, ew car bi car ji law û keçên Mîr Bedirxan re, behsa vê kêmaniyê dike. Loma jî law û keçên Mîr Bedirxan, hema çî bigire her roj, derin nik cîranê xwe R. Xendamian û kêmaniya ko li pey bavê wan maye, bi sûretên xwe dadigirin. Li pey bavê wan tu sûret û wêne neman, lê qet nebe, bila ew bê sûret û wêne nerin...

Fotografê duwemîn a romana yek ji wan fotografan e ko hingê, li ba R. Xendamian tê kişandin. Li ser fotografê du kes, jinek û mêrek, hene; Emîn Alî Bedirxan û jina wî Samîha Xanim. Yanê bav û diya Celadet. Di wê kurte-dema ko ev fotograf tê kişandin de, gelo Emîn Beg û Samîha Xanim çî difikirin, çî dijîn, çî hîs dikin, çî dibêjin?

Bêguman e ko tu gotin, bi çî awayî dibe bila bibe, nikare wê kurte-demê ji nû ve vejîne. Rû û sûret, bi alîkariya kamera fotografê, ji nû ve, eynî mîna eslê xwe, tê vejandin. Lê ne hîs û jiyana ko mîna lehiyekê diherike...

Digel vê hindê, fotografên bêzar û bêziman dikarin alîkarî li taswîr û sal - ixdana hîs û jiyana jî bikin. Di fotografê Emîn Beg û Samîha Xanimê de tiştê ko berî her tiştî bala merivan dikişîne, çavên wan in; du cot çavên reş, mezin, germ ko dikenin. Meriv li ser rûyê wan ken nabîne, rû bi qasî xwe ciddî ne. Lê çavên germ dikenin. Keneke kîbar, ne boq, lê bi pîvan. Meriv dikare ji vê kenê derxe ko hem Emîn Beg hem ji jina wî ziravbi-hîstiyar û diltenik in. Ew bi xwe bawer û têgihîştî ne. Ew ji jiyana hez dikin, lê bîr bi zehmetiyên wê jî dibin.



Di wênê de tiştê duwemîn ko hema bala merivan dikişîne, destên wan in. Herduyan jî destên xwe, bi awayekî serbest, danîne ser çogên xwe. Ew li ser du kursiyan rûniştine. Piştî wan rast, sîng û rûyê wan li pêş e. Emîn Beg serê xwe jî hinekî hildaye. Di destê rastê yê Emîn Beg de tomareke kaxiz heye. Wî herdu destên xwe jî kirine mîna gurmist û ew anîne ser herdu çogên xwe. Samîha Xanimê jî kêr, zêde, bi vî awayî, destên xwe danîne ser çogên xwe. Di destên Samîha Xanimê de cotek lepikên reş hene û di destê wê yê çepê de jî desmaleke spî heye. Meriv dikare bibeje ko tiştê spî yê hemû fotografê, ev destmal e. Ji awayê rûniştin û danîna destan, meriv têdigihê ko Emîn Beg û jina wî hînê fotografkêşanê

28

nebûne. Bi gotina R. Xendamian, ew hê baş nebûne fotojenîk. Lê belê, ev awayê rûniştinê, di eynî wextê de nîşan dide ko hurmet û giramî, rêz û rêzdarî, ji bo wan, qayideyên esasî yên jiyane ne. Li Stembolê, di nav Osmanî û girgirên wan de adet e, gava meriv bixwaze bi hurmet û rêzdarî rûne û vê yekê nîşan bide, hingê meriv destên xwe, bi ûsil, datîne ser çogên xwe û rûdine. Ji wênê jî baş dixuye, Emîn Begê ko bi terbiya rêz û rêzdarî, qedr û qîmet rabûye, bi hurmet jî dijî.

Cil û bergên herduyan jî reş in. Li ser Emîn Beg taximeke kincên reş hene. Qumçikên çakêtê wî heta berstû girtî ne. Li berstû qirawatek dixuye. Kincên ko Emîn Beg li xwe kirine, ne ew kinc in ko herkes dikare li xwe bike. Ew buha ne û bi tenê kesên ko hal û wextên wan di cîh de ne û pêwendiya wan û saraya Osmanî heye dikarin li xwe bikin. aaxa R. Xendamian, fotografkêşê bîrbir, dibêje, »Ji kincan meriv dikare derxe ka ew kes ji kîjan aliyê civata rengîn a Osmanî ye«, ew ne neheq e. Kinc, nîşana çn, kom û gelên civata Osmanî ne. Li ser serê Emîn Beg jî kumekî ko Osmanî jê re dibêjin fes heye. Ev fes jî baş li kincan hatiye û hîn xweştir nîşan dide ka Emîn Beg kî ye. Cil û bergên Samîha Xanimê jî, ji serî heta lingan, reş in. Fîstanekî dirêj û reş ko heta lingan tê, lê ye. Jorê fîstan bi sermaleke dirêj e reş ve hatiye pêandin. Sermal ji serî heta ber çogan tê û hemû stû,

mil û pî vedigire. Di binê sermalê de jî, dîsan reş, dolbendek heye ko ser û porê Samîha Xanimê baş radipêe. Lep ikên reş, reşahiya wênê tamam dike. Meriv ji reşahî û pêandinê fahm dike ko Samîha Xanim dilpak, hezkira mala xwe, sade û dîndar e. Di nav sermal û dolbendê re, tayeke porê wê yan jî ya cênikê wê naxuyê. Bi tenê rûyê wê yê gulover, mîna heyveronê, dibiriqe. çavên wê yên reş, di bin bijangan re, li hember dinihêrin û bi germahiyeke xweş dikenin. Gumên wê mezin û gulover in. Pozê wê, li gora pozê Bedirxaniyan, pahntir e. Devê wê fireh, lê lêv girtî ne. Lêv, ne lêvên kesê ko pir d ipeyive, ne. Samîha Xanim li kêleka mêrê x we, bi gi - ramî, bêdeng, çavbiken, porgirtî, rûvekirî, rûniştiye. Samîha Xanim, alî- gir û piştgira Emîn Beg, dilsoza mala Bedirxaniyan, bi aramî û bawerî, li kamerayê dinihêre.

Herç Emîn Beg e, ew jî, bi bawerî û çavkenî, li kamerayê dinihêre. Lê di nêrîna wî de tiştêkî zêde heye; maxrûrî û asalet. Wî serê xwe hinekî ber bi jor kiriye û li makîna fotografê dinihêre. Ew ji jor ve li hember xwe dinihêre. Wî di wê kurte-dema kişandina fotografê de jî ji bîr nekiriye ko ew, lawê Mîr Bed irxan e, lawê serokê mîrekiya Cizîra Bo tan û rêberê welatê

29

Kurdistanê ye. Ji nêrîna wî dixuye ko ew xwediye berpirsiyariyên mezin û zehmet e. Nerîna wî, nerîna serok û rêberan e. Kaxizên di destande jî nîşan did e ko ew merivê heyama xwe ye, ne paşdemayî, lê pêşketî ye.

Ew bîr bi guherînên mezin ên civakî yên cîhanê dibe û bala wî li ser şoreşên teknîkî ye. Heye ko loma ew di vê fotografa duwemîn a romana de dibe pardarê şoreşa ko R. Xendamian di qertên xwe de behs dike. Di welatê Osmaniyan de zû bi zû meriv rastî kesan nayê ko di destê wan de kaxiz hene. Bi tenê komeke biçûk a civata Osmanî bi karên kaxiz, xwendin û nivisînê rabûne. Ronakbîrî, lebatên çandî, edebî, hunerî û felsefî, bi tenê karê komekê ye. Komek ko di bin tesîra pêşketinên Awrûpayê de maye û bi Awrûpê

re di nav pêwendiyêke xurt de ye. Kaxizên ko di destê Emîn Begê de ne, nîşan didin ko Emîn Beg jî mensûbê koma bijarte ye.

Rûyê Emîn Beg, li gora rûyê Samîha Xanimê, dirêjtir e. Poz, pozê Mîr Bedirxan e; pozê beranan. Riya wî ko êd î spî dike, xweşiyêke taybetî dide rûyê wî. Rî hem asaleta nerînê tamam dike hem jî germahiya çavan dineqîşîne. Lê belê, di fotografê de cîhê hema bala merivan dikişîne, çav in. Meriv pêşî li çavan dinihêre, paşê çavên xwe li ser rû, bed en û kincan digerîne û bi dû re dîsan li çavan vedigere. çav, navenda fotografê ne.

çav mezin û vekirî ne; ew mîna du libên stûr ên tiriya reş dibiriqin. Li ser çavan ken û germahiyeke însanî dixuye. Lê ne bi tenê evçend, tevî ken û germahiyê, êş û nermahiyeke şexsî jî dixuye. çav dipeyivin û saloxdana hîs û jiyana Emîn Beg dikan. Ew êş û nermahiya şexsî ko li ser çavan dixuyin, du stûnên jiyana Emîn Beg in. Wî çavên xwe bi wan vekirine û bi wan dijî. Wî çavên xwe li welatekî xerîb, li sirgûnê vekirin. Sal, 1851 bû. Sal, xedar û dijwar bû; bi ser têkçna serhildana bavê wî Mîr Bedirxan re, bi tenê pênc sal derbas bûbûn. Bi dû têkçna serhildanê re, bavê wî, dê ûdêmariyên wî, mam û metên wî, kek û etên wî, hemû kesên malbata Mîr Bedirxan, zaro û zêç, kal û pîr, ji welatê Cizîra Botanê hatin bidûrxistin.

Rûyê wan ber bi welatên nenas û xerîb hate zivirîn. Mîr Bedirxanê ko ji bo heyîn û hebûna welatê xwe serî hildabû ji welatê xwe bûbû. Ew p êşî li Stembolê hatin bicîhkirin, paşê jî Mîr Bedirxan sirgûnî girava Girîtê bû, dan û standina wî bi hemû dinê re hate birîn û vegera wî ya welêt hate qedexekirin. Emîn Beg, lawê mîrê kurdan, çavên xwe, rojek ji rojên zivistana Zerya Spî ya bi ba û baran, ji welatê bav û kalan pir bi dûr, li girava tenê û b êkes, li dinyayê vekir. Xerîbiya welatên nenas û hesreta welatê bav û kalan ji roja bûyinê ve mohra xwe li jiyana wî xist. Jiyana wî bi xerîbî û hesretê hate rapêçandin. Ew êş û nermahiya ko li ser çavan in, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e.

30

Cecoyê min, kurê min, ew êş û nermahiya ko ji çavên bavê te dix- uye, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e. Tu hê pê nizanî, derdên xerîbî û hesretê dijwar in.

Samîha Xanim lawên xwe Celadet û Kamuran li kêleka xwe dane rûniştin, li pêlên Zerya Marmarayê dinihêre û ji zarokan re behsa bav û kalikê wan dike. Ji salan 1898 e. Celadet ketiye sala pêncan, birayê wî yê biçk ko du sal bi dû wî re hatiye dinê, nû ketiye sala sisiyan. Birayekî wan ê din jî nû hatiye dinê; Hîkmet.

Dinya havîn e, esman çîk sayî ye. Hawirdor di nav hêşînahiyeke gelek xweş de ye. Zerya Marmarayê, hêdîka, xwe dilivîne û p êlên xwe yên spî û qels, bi zehmetî, radigihîne qiraxa avê. Li ser ava ko mîna cawekî hewreşîmî dixuye, keştî, bot û qayik giran giran digerin. Ji dûr ve keştiyeke dûkelî yê mezin dûyê xwe berdide û avê diqelişîne, dere. Samîha Xanim, tevî lawên xwe û du cêriyan, li Büyükkada, girava havîngeha malbata Bedirxaniyan e.

Li Büyükkadayê, li milê bakur, li ber quntara girê îsa ko tirk jê re dibêjin îsa Tepesi, du xaniyên havîngeh ên malbata Bedirxaniyan hene. Herdu xanî jî mîna hev, lê ji hevûdu hinekî dûr in. Ew bi du qatan, ji ber û ke- viran lêbûne û bi siwaxeke spî hatine siwaxkirin. Xanî fireh in, lê bêguman ew têrî malb ata mezin a Bedirxaniyan nakin. Loma jî en damên malbatê bi dorê tên Büyükkadayê. Büyükkada, xweştirîn havîngeha Stembolê, lûlûya Marmarayê, warê duwemîn ê Bedirxaniyan e. Ew bi hêsanî xwe radigihînin Büyükkadayê. Jixwe Kadikoy û Büyükkada ne zêde dûrî hev in.

Ji lengergeha Kadikoyê, bi keştîyê, di bîskekê de, meriv xwe digihîne Büyükkadayê. Loma jî endamên malbatê kengê bixwazin, hingê derin Büyükkadayê.

Büyükkada û çend gir avên din, mîna yaqûdên zumrudî, gewriya Zer ya Marmarayê dineqîşînin. Giravên Kinali, Burgaz, Kaşık, Heybeli, Büyükkada, Pide, Tavşan û Sedefê bûne cîhê starê, cîhê bîhnvedan û îstirehetê. Stembola kevnare, Konstantinopolisa cîhana xiristiyanan, navenda tevgera ronakbîrî û çandî ya dewleta

Osmanî êdî roj bi roj teng dibe. Ji her aliyên tixûbên bêser û bêber ên Osmanî, ji her millet û gelî, bi hezaran kes tên li Stembolê bi cîh dibin. Stembol, payitextê dewleta Osmanî êdî ji kargerînendeyên dewletê re biçk tê. Ew xwe davêjin cîhê

31

havingeh û seyrangehan. Girav, bi av, plaj, çem, rûbar, ger, hêşinahî, daristan, bax, baxçe, rez, gelî û girên xwe, bûne koşeyekî bihuştê. Bi taybetî jî Büyükada. Büyükada, girava kulîlkan e. Sal donzdeh meh girav bi ş îlan, nîlufer, sosin, nêrgiz, qerenfîl, berbiro, gulale û rengên gul, binevş ,beybûnê dixemile. Rengek winda dibe, yekî nû tê dewşê. Büyükada, girava rengên dewlemend e. Girav hemû zerya direngîne. Rûniştevanên giravê yên esasî, hema çi bigire hemû, masîvan in. Ew adet û ûsilên hezar salan, ji dem û dewrên Bîzansê, didomînin. Ew ji zeryayê werdigirin û dîsan d idinê. Büyükad a, girava tarîxî, bi qasî ko havîngeh e, ew p arêzgeh e jî. Ew, di nav zerya de, adet û ûsilên kevnare, li hember wext, dewr û dewranê diparêze.

Xaniyê ko Samîha Xanim û lawên wê tê de ne, li kêleka avê, li ser kaşekî, ava bûye. Wî pişta xwe daye girê îsa. Li dora xênî darên spîndar û bî hene. şaneşîneke fireh û dirêj a xênî heye. Dora şaneşînê b i caxên textîn rapêaye û ji şaneşînê hemû Marmara bi rengê xwe yê yaqûdî li ber ligan e. Li herdu ko şeyên şaneşînê du mêwên stûr ên tirî hene. Qurnên mêwan fireh in û ta û çiqilên wan, mîna banekê, hemû jorê şaneşînê dagirtiye. Mêw mîna holikekê, bi dûzan, taldeyekê dide şaneşînê. aaxa dinya germ û xweş e, şênîyên xênî li wir rûdinin. Samîha Xanim û lawên wê Celadet û Kamuran li wir, li ser cilên rax istî rûniştine. Dinya çikronî ye, danê sibê hêdî hêdî diqulipe ser danê êvarê. Celadet ko pir zû mezin dibe, niha ketiye heyama xwe ya pirsîyaran. Ew her tiştî merak dike, her tiştî dipirse, dixwaze her tiştî bizanibe.

– Yadê, ka kekê min Sureya li ko ye? Yadê, em çima narin Cizîra Bota?

Yadê, em çima li malê bi tirkî nap eyivin? Yadê, çima çavên bavê min ca- rina kelgirî d ibin? Yadê, ez dikarim hilkişim ser vê darê û xwe jê bavêjim? Yadê, leglega ko bebîş Hîkmet an î, ç ku? Yadê, çima mam û metên min evçend pir in?..

Samîha Xanim jî hêdî hêdî bersîva wî dide. Ne bi tenê Sa mîha Xanim, lê Emîn Beg, cariyên malê, ap û met jî bersîva pirsên Celadet didin. Pirs pir in, têra hemûyan dikin.

Bêguman pirsên min nayên bîra min. Piştî demek pir dirêj, bi alîkariya feylesofên almanî, ez hîn bûm ko pirs û pirsiyar lehiya ava zelal e. Lehî her - tim, pihêt, diherike. Ava zelal û paq ij dibiriqe. Lê gava lehî bi kar were, ew hêja ye. Gava meriv bikaribe ji quwet, zelalî û paqijiya wê destketî bibe, ew giranbiha ye. Pirs jî, gava bersîv hebin, hêja ne. Gava bersîv heb e, pirs dibin lehiya ava zelal û diherike. Ez bawer im ko Yadê bîr bi vê yekê dibir. Me jê çî jî bipirsiya, wê bi aramî û pir sakîn bersîva me dida. Wê dixwest pirsên me biq ulibîne ser lehiya ava zelal.

32

Ew havîna ko tu niha behs dikî, mîna xewnekê tê b îra min. Sûretên wê havînê li pey mij û dûmana umrekî dirêj û westiyayî ne. Lê pa şê Yadê ji min re, bi kitekit, gotibû; wê havînê ez derketibûm ser wê çardaxa ko tu behs dikî. Min bi gotina xwe kiribû, ji ser çardaxê re jî min li Marmarayê nihêrbû. Ez çiqas li wir mabûm, min li wir çî kiribû? Kes bi vê yekê nizane. Lê çaxa ez daketim jêr, ew bûyera ko hemû malê her qal dikir, diqewime; ez ji jêr heta jor diqelişim. Belê, te çewt nebihîst, ez diqelişim. Gava ez xwe bera jêr didim. Ez rastî koşeyekî tûj ê stûna hesinî yê ko qurnê mêwê pê hatiye girêdan, tîm û ji nav şeq an heta ber sîngê diqelişim. aîroka vê bûyerê ko şopên wê her û her li ser bedena min diyar bûn, dirêj e. Ez serê te neêşîn- im, lê, li gora gotina Yadê, ez ji mirinê xelas dibim, çend car, çend gavan ber bi aliyê mirinê jî davêjim, lê bi dû re jê vedigerim. Vegera min kêfa bav û diya min û hemû malbatê tîne. Lê bîrînên min jî zêde dibin; li birînên serê min ko ji roja hatina dinê yadîgarî min bûne, birînên berzik, zik û bersîngê jî zêde dibin.

Wê havînê, li Büyükkadayê, ez ji bêgaviyê dibim hevalê cîh ûnivînan. Pirsiyarên min jî hingê hîn pirtir dibin. Pirs li ser pirs, gotin li ser gotin... Yadêya reben... kî dizane wê ji ber pirsên min ên hî û pûç çî kişandiye û çiqas hewl daye ko wan biqulibîne ser lehiyeke xurt, zelal û de - lal...

Celadet û Kamuran li herdu aliyên Samîha Xanimê rûniştine. Kamuran li ber çogê wê ye. Siniyeke fireh a zebeşekî sor ê hûrkiî li ber wan e. Samîha Xanim perçeyekî biçk dide Kamuran, destê xwe yê din di ser porê wî re dibe û gotina xwe didomîne,  
– Cecoyê min, çavreşê min, ez li ber destê dapîr a te û li mala Bedirxanpaşazadeyan mezin bûm. Ez wan baş nas dikim. Evîn û hesreta welatê Kurdistanê bûye kozeke agir û ketiye dilê wan. Nemaze evîn û hesreta bavê we... Ew lawê mîrê mezin Bedirxan Beg e û îro jî mezinê malbata mezin a Bedirxan Beg e. Jê gelek tiştên xwestin.

Celadet li diya xwe guhdarî dike û zebeşê ber xwe dixwe. Ew perçeyekî biçk dixwe devê xwe û perçeyekî biçk jî, piştî ko dendikên wî jê derdixwe, dide destê Kamuran. Kamuran perçe dixwe nav lepê xwe û ew jî wî dide diya xwe. Samîha Xanim û Celadet dikenin. Samîha Xanim serê Kamuran maç dike û jê re dibêje;

33

– Eferim kurê min, ji niha ve tu nîşan didî ko tu neviyê Mîr Bedirxan î. Comerdiya wî bi te re heye. Eferim, K amoyê min, eferim.

Celadet hinekî din nezîkî diya xwe dibe û dîsan jê dipirse, - Yadê, çavên min jî, mîna yên Bavo, reş in? aima rîha wî heye û rîha min tune? Yadê, tu dê ji min re ji kincên bavo bidî dirûn? Kincên Bavo pir spehî ne...

3

Bavo, kincên te pir spehî ne, gava ez mezin bim, ez ê jî kincên te li xwe bikim.

Emîn Beg bi gotina lawê xwe Celadet dikene. Wî herçar lawên xwe, Sureya, Celadet, Kamuran û Hîkmet dane dora xwe û bi hev re li çayxana seyrangeha Modayê rûniştine. Emîn Beg û lawên wî Sureya

û Celadet çay, Kamuran û Hîkmet jî leymonata vedixwin. Murebiya zarokan Madam Stella jî bi wan re ye. Sal ber bi 1900– an dere. Ji 1900-ê re hê şeş meh hene. Wext mîna avê diherike. Celadet hinekî din mezin bûye. Kamuran bi tirkîyeke wisan xweş dipeyive ko mezin diheyirin.

Hîkmet, bi lez û bez, li dora xwe çerx dibe. Herç Sureya ye, simbêlên wî êdî reş dikin.

Seyrangeha Modayê ko Osmanî jê re dibêjin Moda aayiri, cîhekî ji cîhên herî xweş ên Stembolê ye. Moda aayiri ji qonaxa Bedrî Paşa hinekî bi dûr, li ser çend giran, bi dar û ber tijî, li peravên Marmarayê, bihuşteke bira ye. Ew di navbera Moda Biçûk û Moda Mezin de, lê bêtir nêzîkî Moda Mezin e. Moda aayiri, nemaza bihar û havînan, dibe seyrange- heke yekta. Hingê her der di nav hêşînahîyeke bêpayan de ye. Gul û kulîlk bi rengên xwe yên cuda hemû hawirdor dixemilînin. Ji ser daran dengê bilbil û şalûran tê. Dengê ava coyên biçk li dengên çûk û teyran zêde dibe. Li seyran gehê çend çayxanên havînê hene ko hertim tijî ne. Ji çayxanan, Marmara mîna xweştirîn bergeha cîhanê dixuye. Rojên îniyan, çaxa ko xelk ji kar û şixulên xwe vala ne, ew pêl bi pêl tînen seyrangehê. Hingê, rojên îniyan, ne îşê aqil e ko meriv were seyrangehê.

Lê niha, di vê roja sêşemiyê de, seyrangeh û çayxane hinekî sakîntir e. Emîn Beg merivekî bi qayide ye. Wî gelek tişt ji xwe re kirine adet. Ew divê her roj îşligê paqij li xwe ke, her roj serê sibê bi meqes û mûçikê simbêl û riya xwe çke, bi xwarina firavînê re li rojnama Icmal-î Ahval binihêre, ken û henekên ko dibîse yan jî tînen bîrê di defterekê de binivîse, heftê carekê hin bira û xwişkên xwe yên ko li Stembolê dijîn ziyaret bike,

34

heftê carekê êvarekê yan jî danekî lawên xwe li dora xwe bicivîne û bi wan re bipeyive, ders û şîretan bide wan û bi wan re bi kurdî bipeyive...

Hatina seyrangeha Modayê jî yek ji adetan e. Gava dinya bihar yan jî havîn be, her çaxa ko ew tê serdana birayê xwe Bedrî Paşa, ew tê



seyrangehê jî û du qedeh çay vedixwe. îcar wî zarok û murebiya wan Madam Stella jî bi xwe re birin mala Bedrî Paşa, cîhê ko Celadet lê hate dinê.

Sebebê çyinê jî tiştêkî pir pîroz bû; birayê wan Mîthed, li Misirê, rojname kurdan a yekemîn Kurdistan derxistibû. Gerçî wan bihîstibûn ko rojname dest bi weşanê kiribû, lê wan rojname bi xwe nedîtibû. Rojekê berê, serê sibê, dostekî wan ê malbatê ko bi keştiyê ji Kahîrê, Misirê hatibû, du nusxeyên rojnamê bi xwe re anîbûn û ew dabûn Emîn Begê. Dostê Emîn Beg hatibû Kiziltoprakê, mala wan. Gava Emîn Beg rojname dîtibû, ji kêfan, hêstir ketibûn çavên wî. Mîna ko ji wan re zarokêkî nû çbe, eynî welê, Emîn Beg, bêpayan, kêf kiribû. Wî d ostê xwe, ji kêfan, hembêz kiribû, ew dabû rûniştin û di bîskekê de hemû rojname xwendibû. Ne bi tenê carek jî, du caran. Ew bûbûn xwediyê rojnameyekê. Kurd êdî ketibûn defteran. Navê Kurdistanê bûbû navê rojname birayê wî. Navê welatê kurdan wê êdî li ser lêvan bûya. Xewn û xwestekên wan êdî bi cîh dihatin... Wî ji dostê xwe hal û hewalê birayê xwe yê biçk Mîthed pirsîbû, li ser rewşa rojnamê jê agahî wergirtibû. Wan bi hev re firavîn jî xwaribûn û piştî firavînê wî bang zarokên xwe kiribûn û ew bi hev re, bi faytonekê, ber bi qonaxa Bedrî Paşa, ketibûn rê.

Wê şevê ew li qonaxê mabûn. Birayên Emîn Beg ên din Alî şamîl Paşa, Evdirrehman, Zubeyir, Husên, Mistefa, Kamil, Mirat û biraziyê wan, lawê Necîb Paşa Avdurrezak jî hatibûn qonaxê. Ew bi birayê xwe Mîthed serbilind bûn. Belê, Mîthed li ser şopa bavê wan Mîr Bedirxan bû. Wî kurd kiribûn xwediyê rojnameyeke kurdî û mîllî. Li ser rûpela yekemîn a rojnamê bi tîpên reş û mezin Kurdistan hatibû nivisîn. Di binê de jî bi tarîxa Hicrî 1315 hatibû nivisîn. Li kêlekê jî weha hatibû nivisîn; »Heçî kaxizek vê rêke, divê rêket Misirê ser navê xweyiyê vê cerîdeyê lawê Bedirxan Paşa Mîqdad Mîthed Begê... Her car du hezar cerîdeya b êpere ez ê rêkim Kurdistanê, de bidin xelkê... pazde roja carekê têt nivîsandin.«Rojnameyê bi »Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm« dest bi

nivîsê fikir. Di rûpela dawîn de jî, »Li Misrê Metbeet El-Hîlal de tebî-  
bîye« hatibû nivisîn.

Wan wê şevê heta destê sibê rojnama xwe û serfiraziya birayê xwe  
Mîthed pîroz kiribûn û li ser halê malbatê û kurdan peyivîbûn.  
Dotira rojê, piştî

35

nîvroyê jî, Emîn Beg zarok wergirtibûn û hatibû seyrangeha  
Modayê. Bask tune bûn ko Emîn Beg bi wan bifire. Li hemû dinê,  
merivê herî mesûd û bextiyar niha ew e. Ew seriyekî şekir dixwe nav  
qedeha çayê, bi kevç çayê tev dide, jê qultekê vedixwe û li zaro kên  
xwe d inihêre. Ev çaya diduyan e ko ew vedixwe. Madam Stella  
alîkarî li Hîkmet dike da ko ew lîmonata xwe vexwe. Rojnama  
Kurdistan-ê, vekirî, li kêleka qedeha Emîn Begê, li ser masê ye. Danê  
êvara Modayê bi aramî dadikeve. Aso bi sorahiyeke vekirî hatiye  
neqîşandin. Tîrêjên jar ên tavê li ser ava paq ij a Marmarayê dikenin.  
Ji doraliyên coyên avê, niha, dengê beqan jî tê. Sureya ko bi  
qelafetê xwe êdî ne kêrî bavê xwe ye, li kêleka bavê xwe rûniştî, li  
dara mezin û qehîm a çinarê ko ew li binê rûniştine, dinihêre. Dara  
bedew hêlîna çivîkan e, jê dengên ewçend xweş tîn ko meriv  
pê mest dibe. Celadet, bi heyranî, li çavên bavê xwe dinihêre.  
Kamuran, pantolên kin li lingan, li ser kursiyê rûniştî, lingên xwe ba  
dide û lîmonata xwe vedixwe. Emîn Beg çend qultên din ji çaya xwe  
vedixwe û rojnama li ber xwe dixwe destê xwe. Ew carek li rojnamê,  
carek jî li Celadet û

Sureya dinihêre û bi ken dibêje;

– Sureya û Celadetê min, lê guhdarî bikin, binihêrin ka mamê we yê  
zîrek, bi zimanê xwe yê spehî, çi dinivîse.

Bi gotina xwe jî, ew rûpela duwemîn vedike û bi dengê xwe yê gur  
dest bi xwendinê dike; »Gelî mîr û axano ! Gunehê zarûyên we wê  
stûyê we be. ûn jî zarûyên xwe rêkin bidin xwendin. Dewlemendên  
we bila gunda de mekteba çkin, riya Xwedê de xêra bikin... Gelî mîr  
û axa û Kurmancno!

Dinya zane kurd camêr in. Lê vê zemanê ha de şer bi camêrî tenê nabitin... Hekî we guh neda van nesîhetên min, hekî dîsa hûn şivanî û rênçberiyê tenê bikin, zemanek hindik de Kurdistan wê yekcar xira be...«

Xwendin bi vî terhî demekê dewam dike. Ji xwendin û dengê Emîn Begê fahm dibe ko ew kêfxweş e. Serê Sureya ber bi jor, ber bi dara çinarê ye. Celadet, bi dîqet li bavê xwe û xwendina wî dinihêre. Piştî ko Emîn Beg xwendina xwe diqedîne, ew bi ken, yek bi yek, li zarokên xwe dinihêre. Ev zarok heyina wî, rûmet û pêşeroja wî ne. Ev ê bidin ser şopa bav û kalan û mirazên bav û kalan bi cîh bînin. Loma jî ew divê bixwînin, perwerde bibin, têbigihên, jîr û zana bin, desthilat û bîrbir bin, welat- evîndar û bîrewer bin. Ew çaya li ber xwe vedixwe û wê diqedîne û paşê jî li Celadet vedigere û dibêje;

– Ceco, kurê min, li min guhdarî bike, ez, bi qewlê mêrê qenc, soz didim te. Eger tu jî mîna mamê xwe Mîthed jîr bî û di rojên bê de mîna

36

mamê xwe rojnameyeke weha bijarte derxîni û serê me pê bilind bikî, ez ê ji te re ne taximek, lê çend taxim kincên ji yên min jî xweş iktir bikirim.

– Bavo, ez ê derxim, tu dê bibîni, ez ê cerîdeyeke pir spehî derxim.

Belê, rast e, min hingê weha got... Qewl û soz mîna tovan in. Meriv wan di zikê dewr û dewranê de diçne da ko ew di pêşerojê de hêşîn werin. Lê herwekî ko ji tov re ax, av, tav, germahî û hewa divê, ji qewl û sozan re jî rûmet, xebat, sebat, lêgerîn, xîret û evîn divê. Di ser her tiştî re jî evîn. Evîn reh e. Evîn ruh e. To v li ser rehan hêşîn tê. Ma heta tov xwe bi rehan bernede nav kûrahiyên axê, ew dikare bibişkove, zîl bide û bejn bavêje?.. Min jî, bi evîna ko ez ji mala xwe, bav û diya xwe hîn bûbûm, soz da bavê xwe ko ez rojnameyeke spehî, mîna rojnama mamê xwe, b iweşînim. Ez bûm rojnamevan. Min rojname jî derxist û ne bi tenê yek, dudo. Ez nizan - im ka ew di hêjahiya rojnama mamê min de ne, lê min bi aşq û evîn ew derxistin û yadîgarî milletê xwe kirin. Gava umrê min hinekî

mezin bû ûmin êdî bîr bi çerxa gerdûnê û qesta felekê bir, bavê min ji min re çend tax- im kinc dan dirûn. Lê bêyî ko ew rojnamên min bibîne... Belê, wî rojnamên min nedîtin. Gava her hejmareke rojnamên min derdiketin, min jî mîna bavê xwe hejmara nû vedikir, rûpel bi hêdîka diqulipandin û ez, bi dengekî berz, difikirîm û min digot, »Xwezî niha bavo vê hejmarê bidîta.« Mixabin, wî ew nedîtin.

bûne paşa, wezîr, aqilmend, zabit, muteserif û ew karê dewletê digerînin. Ew li ser lêvan in, herkes qala wan dike, bi hezaran, sed hezaran kes 4 Mixabin ko wî ew nedîtin, lawên Mîrê me yê gorbehîşt niha bi navê wan sond dixwe. Lê gelek heyf ko Mîr Bedirxan ew nedîtin... Ma ez çî bibêjim, xwezî we kalikê xwe bidîta! Amojna Sitî, bi axîn bîhna xwe berdide û weha dipeyive. Pêwendiya Amojna Sitî û romana li ser zimanê romanê ye. Celadet Beg dixwest romana xwe bi kurdî binivîsiya. Romana Bîra Qed erê bi kurdî tê nivîsîn. Eger meriv li reh û sebebên vê yekê bigere, meriv divê xwe bi Amojna Sitî bigihîne. Amojna Sitî, dilgira malbata Bedirxaniyan, zarşêrîna zarokan û çîrokbêja meclîsan e. Ew ji dem û dewra Mîr Bedirxan maye. Bav û diya wê li qesra Mîr Bedirxan, mîna seyis û berdestên mîr jiyane. Ew botî û kurdên êzîdî bûne. Bavê Amojna Sitî di serhildana mîr de jî hertim li ba mîr bûye. Gava serhildanê ji aliyê Osmaniyan şikest xwariye û mîr mecbûr bûye ko xwe vekişîne keleha Erûhê, bav, dê û

37

Amojna Sitî jî pê re bûne. Umrê Amojna Sitî hingê 7-8 sal bûye. Bi dû serhildanê re jî sirgûn û koç hatiye. Hemû malbat, tevî herkesî, ji Cizîra Botan hatiye bi dûr xistin. Hin gê ew jî, bavê Amojna Sitî Apê Xelef, diya wê Gulîzer û ew bi xwe, ketine ser riya welatê xerîbiyê. Sala 1846 -an, bi hespan û di bin çavdêriya ordiya Osmaniyan de, piştî rêwîtiyeke çend mehan, ew gihîştine bajarê Zerya Reş, Samsûnê. Ji wir jî, ew bi keştiyeke mezin, ji zeryayê, çûne Stembolê, payitextê dewleta Osmanî. Roj û mehên wan ên Stembolê pir dijwar bûne; Mîr Bedirxan, çar jinên wî û sê zarokên

wî ji wan tèn vejetan din û ew li ko şekeke biçk tèn bicîhkirin, lê yên mayî hemû qor bi qor di nezareta Zaptiyê de hepis dibin. Ro û tav li wan dibe heram, nan û ava wan tê birîn, dinya li wan dibe zîndan. Bi dû zîndana Zaptiyê re, ew dîsan, bi keştiyeke mezin ber bi girava yewnanî Girîtê tèn şandin. Mîr Bedir Xan, çar jin û sê zarokên wî û malbatê, tevî

Apê Xelef û mala wî, li bajarê Xaniyayê tèn bicîhkirin. Lê belê Osmanî malbat perçe dikin û gelek endamên malbatê jî li Stembolê, li aliyê Anatoliyê, Kadikoyê tèn bicîhkirin.

Amojna Sitî heta sala 1862-an jî li Girîtê dijî. Piştî ko bavê wê wefat dike û diya wê jî tevî Mîr Bedirxan dere şamê, ew jî tevî hin endamên malbata Bedirxaniyan, tê Stembolê û li ba Bedirxaniyan bi cîh dibe.

Rojekê li vê malê, rojekê li wê malê, di navbera malên Bedirxanan de, ew porê xwe spî dike. Hemû zarokên malbatê ko li Stembolê tèn dinê, ji ber destê Amojna Sitî derbas dibin. Amojna Sitî kûpa gotinên kurdî ye, gencîneya stran, dîlan, çrok, çrçrok, methelok û mamikên kurdan e. Ew şahîda tarîxa malbatê û serpêhatiya Mîr Bedirxan e. Ew rû û zimanê adet û ûsilên kurdî ye. Ew dengbêj û çîrokbêj e. Serpêhatiya Mîr Bedirxan, sirgûna wan, salên Xaniyayê, deşt û zozanên welatê kurdan, çemên Dijle û Firatê, çiyayên Cûdî û Herekolê, şikeftên spehî û xweşbergeh, jiyana eşîrî û koçerî ya welêt... ev hemû bi zimanê Amojna Sitî dibin lehîyeke zelal û diherikin, dibin berfendeyeke spî û hawirdor vedigirin, dibin destaneke bêdawîn û mêjiyê guhdaran dineqîşîn. Ma meriv li welatê xerîbiyê, li Stembolê dikare ji Amojna Sitî çtir mamostayeke hêja bibîne? Ma kî dikare ji wê çêtir zimanê bav û kalan, kurdiya welêt hînî zarokan bike?

Digel ko Amojna Sitî nêzîkî çil salan li Stembolê, di nav navenda zimanê Osmanî de jiyaye, ew hê jî bi gotineke tirkî nizane. Mîna ko ew ne li dinya îro, lê ya do dijî. Bedena wê li Stembolê, lê bîr û heşê wê li welatê zarokiya wê ye; welatê salên zarokiyê bihuşteke rastîn û nemir e. Ew gorî-

cana Malbata Bedirxaniyan, pîrika zarokên wan e. Zarokên Bedirxanî, ji kijan bav û diyê dibin bila bibin, ew hemû nevî û torinên wê ne. Niha jî, di vê roja xweş a payiza 1902-an de, ew li Kiziltoprakê, li mala Emîn Begê, li nik torinên xwe Celadet, Kamuran, Hîkmet, Tewfîk û Safter e.

Belê, niha Tewfîk û Safter jî hene. Hejmara lawên Emîn Alî Bedirxan gi- hîştiye şeşan. Lawê herî biçk Safter, bi gotina Amojna Sitî, çilkeke zêr e, melayikekî bêbask e, ronahî û çira mala Emîn Beg e.

Tu dizanî, her mirov cîhaneke xweser e. Her mirov, tevî jîn, serpêhatî, tecrube, hîs û pejnên xwe, hêjayî cîhanekê ye. Nasîna mirovekî, keşfkirina cîhaneke nû ye. Lê nasîna Amojna Sitî, keşfkirina sed cîhanan bû. Di umrê wê yê keserkûr de sed cîhan gihabûn hev; cîhana bedew a zimanê kurdî, cîhana spehî ya mîrekiya bapîrê min Mîr Bedirxan, cîhana kambax a xerîbiyê... cîhan dikarin weha heta û heta dirêj bin. Min tahma zimanê kur- dî ji gotinên wê wergirt, hest û heyecana stran û çro kan, hez û evîna we- latê Cizîra Botan ji çîrokên wê yên ko şevên dirêj ên zivistanan têrî nedikirin, wergirt. Amojna Sitî meşaleyek bû ko li mala me û li malên mam û metên min ronahî direşand. Di wan rojan de ko tu niha qal dikî, min û bi- rayê xwe Kamuran li dibistana taybetî Halîle- i Mahmudiye ko ji mala me hinekî bi dûr li Fenerbahç bû, dixwend . Dibistan, ya herî baş a hemû Kadiko yê bû. Xaniyê wê nexweş bû, xaniyekî textîn ê sêqat Lê ders baş bûn û mamostayên wir jî bijarte bûn. Bi taybetî jî dersên fransizî, ziman, tarîx û zanîna welêt ko jê re »Malûmat-i Vataniye« digotin, pir baş bûn. Bavê min perene mezin didan dibistanê da ko em li wir bixwîn. Heftê d u caran jî em diçûn aliyê din ê Stembolê, Beyo ð luyê û li wir, nêzîkî Cade-i Kebir, me ji Signori Giovanni Parovel dersên musîkê digirtin. Signori li dibistana îtalî Giuseppe Garibaldi mamoste bû, lê dersên taybetî yênmusîkê jî li mala x we dida.

Em hertim bi xwendinê mijûl bûn. Lê belê, gava ko Amojna Sitî dihate mala me, êdî min xwendin did a aliyekî, min xwe li nexweşiyê

datanî û ez li malê dimam. Mala ko bi stran, çrok, serpehatî û gotinên Amojna Sitî diqulipî ser qesra Birca Belek a welatê bav û kalên min...

– Ma ez çî bibêjim, Amojna Sitî çavên xwe li zarokan digerîne û dibêje,

xwezî we kalikê xwe nas bikira. Gotin têrî pesindana wî nakin. Ma ez rebe- na Xwedê çawan wî bidim nasîn?.. Bejna wî dirêj, laşê wî gir bû. Dengê wî gur, gotinên wî xweş bûn. We digot qey, ew şêr û pilingê çiyayên şengalê

39

bû. çavên wî, mîna çavên teyrê simîr ê çiyayê Sîpanê Xelatê, spehî û dûr- bîn bûn. aaxa wî gava xwe davêt, erd li bin lingên wî dihejiya. aaxa wî serê xwe ber bi jor dikir û rîha xwe şeh dikir, stûyê wî dibû mîna stûyê hespê Bozê Rewan ê Memê Alan. Hertim kincên spî yên neqîşkirî û hewreşîmî lê bûn. Ew dostê feqîran, dijminê neyaran bû. Ew bi pişta xwe xurt, bi gotina xwe mêr bû. aar jinên mahrkirî û şanzde jî cêriyên wî hebûn. Ev mam û metên we yên bêhesab hemû ji pişta wî ketine. Wî bi şîrê teyrê baz dest bi xwirîniya x we dikir û bi şîrê şêrê dirende paşîva xwe diqedand. Mîna îro tê bîra min, çaxa em ji welêt hatin bi dûrxistin, em bi qasî salekê li ser rîyan man. Hingê li ser wan rîyan, ji mîrê me re, sê zarok çbûn, Yezdanê Pak sê zarok danê. şûrê wî jî, mîna pişta wî, xurt bû. Lê qewlê wî nerm, wîjdana wî paq ij bû. Lo, zarokno lo, çavreşên mino lo, ma ez çî bibêjim, Mîr Bedirxan şêrê welatê Kurdistanê bû.

Kamuran ko heta hingê bi dîqet li Amojna Sitî guhdarî dike, xwe ranagire û gotina wê dibire,

– Amojnê, tu dibêjî »şêr û piling û teyr.« Ma meriv qet dibin şêr û piling û teyr? şêr heywan e însan, însan e...

Celadet û Amojna Sitî bi gotinên Kamuran pir dikenin. Amojna Sitî û zarok ne li ser kursiyan, lê li erdê li ser xalîca raxistî ya salo na malê rûniş- tine. Safter li ser çoga wê ya çepê rûniştiye, Tewfîk jî li kêleka wê ya rastê.

Celadet, Kamuran û Hîkmet jî li hemberê. Amojna Sitî bang Kamuran dike. Kamuran, bi çarpiyan, tê ba Amojna Sitî. Amojna Sitî bi d estê xwe yê rastê porê wî mist dide û ji herdu çavên wî radimûse û paşê dibêje,

– Kamoyê min, aqilfahmê min, gotina te ye, lê eger te bapîrê xwe bidîta, te dê hingê şêr nas bikira. Ew rêberê kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû.

biraziyê 5 Teyar Begê Ertûşî, tevî Emîn Beg, birayê wî Alî şamil Paşa, wî Evdirezax Beg, serokê eşîra Hevêrkiyan Samed Axa û lawên Emîn Beg Sureya û Celadet, ber bi kursiya rûniştinê ya kêleka masa xwarinê dibe û dibêje,

– Mîr Bedirxan rêberê me hemû kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû. Hûn lawên wî jî rêber û serekên me ne. Bi sedhezaran meriv, bi gotineke Mîr Bedirxan, dikaribûn biçna mirinê. Li jor gotina Rebbil Alemîn, li jêr jî gotina Mîr Bedirxan bû. Mala Emîn Begê dîsan şên e. Axa, beg, şêx û giregirên welatê kurdan hertim tî Stembolê ji bo serdana Bedirxaniyan. Ew, piraniya caran, de-

40

rin qonaxên fireh ên Bedrî Paşa, Alî şamîl Paşa, Osman û Husên Paşa. Lê carina jî, mîna vê êvarê, ew tî mala Emîn Begê. Zarokên Mîr Bedirxan ji welatê Mîr Bedirxan hatine veqetandin û vegera wan qedexe ye, lê dewlemend û desthilatên welêt tî Stembolê nik wan. Bûyerên berî 52 salan wan bi hev re girêdide. Tarîxa wan a hevgirtî dibe pira navbera wan û welêt û xelkê kurd. Mîr Bedirxan jî ji Go rîstana Kurdî y a şamê rêb eriya wan hemûyan dike.

Eger giregir ên kurdan zêde na yê mala Emîn Begê, ji ber ko mal, li gora malên din, biçûk e. Mal, li Kiziltoprakê, hinekî ji taxê bi dûr e, ew ji bexçeyekî fireh û xaniyekî duqatî tê pê. Her qatek çar ode hene. Odeyên qata jorîn, yê razanê ne; oda Emîn Beg û Samîha Xanimê, oda Sureya, oda Celadet û Kamuran oda Hîkmet, Tewfîk û Safter. Di qata jêrîn de jî saloneke fireh û dirêj ko ji du milan tî pê, odeyeke fireh a xebatê, odeyeke mêvanan û odeyeke mezin a hizmetkarên malê hene. Oda xebatê, odeyeke fireh e û li bexç



dinihêre. Li aliyê bexç, li ber pencerê maseyêke dirêj û li ko şeya rastê ya masê sandûqeke biçk heye. Li kêleka sand ûqê jî pêûsin û du murekebdank, bi dûzan, hatine rêzkirin. Li ber sandûqê jî kitêbek, di nav bergekî çerm de, mîna remzê masa xebatê, hertim bal d ikişîne. Kitab, destnivîsa Mem û Zîn a şairê navdar û milî yê kurdan Ehmedê Xanî ye. Kitab ji kitabxana Mîr Bedirxan a welêt maye. Bedirxanî wê mîna kitabeke miqedes diparêzin. Zarokên Mîr Bedirxan bi vê kitabê dest bi dersên xwe yê zimanê kurdî û hesta Kurdistanê kirine. Hecî Qadirê Koyî, şairê kurd û perestîşkarê Ehmedê Xanî ko li Stembolê, di salên 1860-70-an de, mamostayê Emîn Beg û birayên wî bû, li ser rûpela yekemîn a destnivîsa Mem û Zînê şîreke dirêj nivisiye. Di şîrê de ew qala mezinahiya Ehmedê Xanî û esera wî Mem û Zînê dike û dibêje; »Eman qedrê bizane em kitêbe / Le dinya êstekî hemtay nemawe / Le eyamî heyatî şêxî Xanî / Le ser nisxey xet ew n ûsirawe...« Ji bilî kitab, pêûs û murekebdankan, li ser masê tu tişt nîn e. Ser masê her gav paqij e. Lê herdu aliyên dîwarên odê heta jor bi kitab, kovar, rojname û kaxizan ve tijî ne. Refên kitêban heta banê ber bi jor bûne. Li aliyê rastê odê, li ber refan nêrdewaneke dirêj heye da ko meriv pê hilkişê û kitabên ko meriv nikare xwe bigihîniyê, daxe jêr. Ji pencerê aliyê paş ê bexç dixuye. Ev alî tevî dar in, lê di nav daran de, dareke çinarê bi qurnê xwe yê stûr û qehîm hemû dar xistine bin bandûra xwe. Li ser qurnê dara çinarê, hin rêz, bi çaquyan, ji aliyê zarokan, hatine kolandin. Yek ji rêzan, bi tîpên latînî, weha ye;

41

Kurdi... Yek jî, bi tîpên erebî, navê Safter e. Lê tîpa dawîn r nehatiye nivîsîn. Bi tenê Saftê hatiye kolandin. Hêlekaneke zarokan jî ji çiqilên darê ber bi jêr dibe.

Mitbaxa mala Emîn Begê jî li qata jêr e, lê ew biçûk e, bi tenê meriv dikare tê de xwarinê çbike. Loma jî aliyekî salonê ji bo xwarinê hatiye veqetandin. Di vê êvara zivistana 1903-an de, malbat û mêvan li wî milê salonê, li ser sifra şîva êvarê rûdinin. Samîha Xanim, Amojna Sitî, Madam Stella û şehrîban, berdesta Samîha

Xanimê, li mitbaxê bi haziriya xwarinê mijûl in. Mêvan ji Cizîra Botan in, bi xwe re bîhn û tahma welêt anîne. Loma jî vê êvarê xwarinên Cizîra Botanê divên. Ji danê sibê ve ye ko Amojna Sitî li mitbaxê rûniştîye û xwarinan hazir dike.

Xwarinên vê êvarê, yên wê ne; sê celeb kutilk, kutilkê mêlakê, yê bi dew û yê kulindê zer. Du celeb xwarinên bi goşt; singûsîr, merga mêlakê. Du celeb savar; savara tûzikê û ya kerengan. Du celeb jî şîrinahî; birinêşîr û tîllok.

Masa xwarinê gelekî dirêj e. Rûmaseyeke spî û neqîşkirî li ser e. Mazûvan û mêvan li herdu aliyên masê rûniştine. Tayar Beg li hember û Samed Axa jî li kêleka Emîn Begê rûniştine. Li kêleka Tayar Begê, Alî şamîl Paşa û li kêleka wî jî Sureya rûniştîye. Celad et jî li hember birayê xwe ye. Jin li dora masê nîn in. Amojna Sitî, Madam Stella û şehriban xwarinan tînin ser sifrê. Li ser sifrê her tişt bi dûzan û di wexta xwe de ye.

Li vê malê qayide gelek girîng in. Ma te di bexçê mala me de tişteki ji bîr nekir?.. Bîr... bîra ko bi qasî çend ga- van ji dara qehîm bi dûr bû. Devê birê girtîbû, ava wê miçiqîbû. Ew bîr û doralîyên wê cîhê lîstikên me bû. Em li dora bîrê, mîna hevya li dora dinê, dizivirîn. Bi taybetî jî ez. Ez her li dora bîrê dizivirîm û dor dibûm...

Herçî qa yide, yanê bi gotina fransîzan prensîpe in, ew mîna zeviyê ne.

Wexteke wan a çandinê û wexteke wan a kemilandinê heye. Ew pêşî tîn çandin, paşê jî, bi wextê, dikemilin. Kê ew çinara bexç mala me çand ib û? Min kir nekir, ez bi vê yekê negihyam. Lê eger kê jî ew çandibe, berî her tiştî ew dara qaîm, toveke biçk bû. Bi dû re, bi wextê, ew kemilî. Qayide sitûnên mala me bûn. Bav û diya min, Amojna Sitî, Madam Stella, şehriban, ew hemû ji bo çandina qayidan dixebitîn. Em zarok bi roj û şev perwerde dibûn. Amojna Sitî, bi bejna xwe ya dirêj û zirav, zimanê kurdî bû. Madam Stella ko bi eslê xwe yewnana Stembolê bû, bi bejna xwe ya kin û bedena xwe ya gulover, zimanê yewnanî, fransîzî û hinekî jî îtalî bû.

Gava wê her serê sibê digot »kalimera« û dîsan bi yewnanî halê me dipirsî û digot »tikanis«, hingê em têdigihîştin ko rojê nû ya perwerdeyî dest pê dikir. Şehrîban, Şehrîbana bedew jî zimanê jîn û bedenê bû. Em zi- manên cihê, cihêtiya jînê, jîna kurdî, kurdîtiya bîr û hestan, bîr û hestên tarîxî û tarîxa xwe ya keserkûr hîn dibûn... Wext, wexta çandina qayidan bû...

Bi qasî çil salan bi dû wan rojan re, birayê min Kamuran di kovara me Hawar-ê de bi navê »Rabûn û Rûniştin« bendek we şand. Bendê weha dest pê dikir; »Kurd gelek bi edeb û terbiye ne. Rabûn û rûniştina wan, danûs- tandina wan bi rêz û tertîb e. Kurd nazik, giran û bi edeb in. Xwediyê go ti - na xwe ne; paşgotiniya xelkê nakin; dostê dostê xwe, dijminê neyarê xwe ne. Pir naxivin, go tina xwe bê sebeb dirêj nakin, gava erê dibêjin, erê ye û gava no dibêjin no ye...« Bend bi vî terhî dirêj dibû. Belê, bend, halê kemilî yê tovên qayidan bû.

Ji salonê bîhna xwarinên kurdî difûre. Mase bi xwarinên cihê xemiliye. Ji milekî ve xwarin tê xwarin, ji milekî ve jî sohbeta li ser welêt û halê welêt germ dibe. Celadetê ko ji kutilkan pir hez dike, giran giran, bi kêr û çetelê, kutilkên teyfika xwe dike du perçe û hem wan dixwe hem jî guhê xwe dide xeberdanan. û ew ji bin çavan ve, bi dîqet, li Samed Axayê ko kutilkan bi destan dixwe, dinihêre. Bav û mamê Celadet, ji peyivînê zêdetir, dipirsin û li mêvanan guhdarî dikin. Kurmamê wî û birayê wî Sureya bi germî dipeyivin û doza welatê Kurdistanê dikin. Kurmamê wî Evdirezak ko bi umir ji Celadet pir û pir mezintir e, bîskeke dirêj, li ser pêwistiya yekitiya eşîrên kurdan û hişyarbûna welatê kurdan dipeyive. Tayar Beg, bi nermî, gotina Evdirezak dibire û berî ko kevçiyê savarê bibe devê xwe, dibêje,

– Gotina te rast e, mîrê min. Lê kar û şixul bê serî nameşe. Her tişt bi rêber û pêşewan dikeve rê. Eger Mîr Bedirxanê rehmetî nebûya, xelkê û eşîrên kurdan xwe li dora serhildanê nedicivandin. Rewş li welêt aloz e. Li aliyekî zordariya Osmaniyan, li aliyekî jî şerê navbera kurdan û ermenan û navbera eşîrên kurdan... Welat li

hêviya law û neviyên Mîr Bedirxan e. Welat hewcedarê kar û şixulên we ye.

6

Emîn Alî Bey, Osmanli ülkesi ve Islam dînînîn sadik evladi Bedirhan Bey-in de ðerli o ðlu, Osmanli vatani her zaman sîze çaliş- ðurlu olsun... ma ve hîzmetlerînîze muhtaçtir. Hayirli, u

43

Emîn Beg spasî wezîrê ko weha dipeyive dike, rûyê xwe ber bi textê Sultan Evdilhemîd dizivirîne û du caran xwar dibe û spasiyên xwe berpêşî Sultan Evdilhemîd jî dike. Sultan Evdilhemîd jî bi ken, hêdîka serê xwe xwar dike û silavan li Emîn Beg vedigerîne. Piştî silavên rêzdarîyê, Emîn Beg li wezîr vedigere û rad iweste. Wezîr ji zabîtê kêleka xwe nîşanek werdigire û bi rêzdarî, bi aliyê çepê yê sînga Emîn Beg ve d ike. Paşê eynî tiştî dubare dike û nîşaneke din jî pê ve dike. Du nîşan, nîşana liyaqatê û nîşana Osmanî li ser redîngota reş, li ser sînga Emîn Beg dibiriqin.

Celadet, bi kêfxweşî, li nik mamên xwe, ji nav mêvanan, li bavê xwe dinihêre. Di vê roja ronî ya payiza 1903 -an de, li Saraya Dolmabahçe, salona Muayedê, bavê wî bi merasîmekê, nîşanên dewleta Osmanî ji Sultanê dewletê werdigire. Bavê wî ew jî bi xwe re aniye merasîmê. Bask nîn in ko Celadet pê bifire. Ew li Dolmabahç, di salona bedew a Muayedê de ye û li bavê xwe û Sultanê dewleta Osmanî dinihêre! Wê şevê qet xew neketib û çavên wî. Di nav lihêfan de, wî mîna şujiyekê, xwe badabû û bi zehmetî kiribû sibe. Destê sibê jî, berî herkesî, ew rabûbû, dest û rûyê xwe şuştibû, kincên xwe yên nû ko ji bo wê rojê hatibûn dirûtin, li xwe kiribûn û li hêviya bavê xwe mabû. Diya wî û şehribanê jî, xweş, porê wî şeh kiribûn û qirawata papyonê pê ve kiribûn. Herçî bavê wî bû, gava ew li dora saet heyştan ji qata jor peyayî jêr bûbû, redîn - goteke dirêj û coteke pantolê reş li serê dibiriqîn. Ew jî ji bo merasîmê hazir bû. Merasîm di saet dehan de bû. Piştî xwirîniyê, paytona mamê Celadet, Elî şamîl Paşa hatibû ber derî, ew lê siwar bûbûn û tevî Elî şamîl Paşa, Murad Beg, daketibûn

lengergehê. Ji wir jî, bi keştiyê, bi hevaltiya teyrên zeryayê, ew derbasî aliyê din ê Xalîê bûbûn. Li wî alî jî paytona mezin a mamê Celadet, Osman Paşa ko li ber destê Sultan Ewdilhemîd dixebitî, li hêviya wan bû. Birayên din ên Emîn Beg ên Serasker Bedrî Paşa, Necîb Paşa, Husên Paşa, Mehemed Elî Beg û kurmamê Celadet, lawê Necîp Paşa Ewdilrezak jî li Dolmabahç li hêviya wan bûn. Gav a ew gihîştin Dolmabahç, Ewdilrezak Beg li ber deriyê bexç Dolmabahç li benda wan bû. Ewdilrezak Beg li Sarayê, mîna wergervan û teşrîfatvan, dixebitî û gelekî nêzîkê Sultan Ewdilhemîd bû. Celadet heyranî kinc û lixwekirinên wî bû. Wê rojê jî kinceke nû ya frengî û fesekî sor ê nû ahengeke taybetî dabû wî û bejna wî ya dirêj. Simbêlê wî badayî, rûyê wî bi ken bû. Wî ew biribûn hundir. Li gora gotinan, salona ko ew niha lê bûn, Salona Muayede, ya

44

Dolmabahçê, salona herî xweş û mezin a hemû Awrûpayê bû. Salon, tîmsala xweşî, mezinahî û spehiyê bû. Li erdê xalîçên mezin, fireh û rengîn raxistî bûn. Kêlekên deriyê mezin ên salonê bi mehfûrên rengîn ko ji her aliyên welatê fireh ê Osmanî hatibûn, raxistî bûn. Dîwar û banê salonê bi neqîşên naqaşên herî hoste hatibûn rengandin. Aira û şam- dankên zêrîn û zîvîn xweşahiya dîwaran temam dikirin. Penceren salonê fireh û dirêj bûn û bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin. Ji hemû salonê bîhneke mîna bîhna gul û emberê difûrî. Niha, Celadet, tevî bav û mamên xwe, li vê salonê bû! Îro, ji bo Emîn Beg û Bedirxaniyan, rojê tarîxî ye. Ji mêj ve bû ko zîmanên hesûd û zikreş li Stembolê belav dikirin ko Sultan dê malbata Bedirxaniyan ji Stembolê derxe û sirgûnê deverên dûr bike. Wan zîmanan belav dikirin ko Bedirxanî li dijî Sultan di nav dek û dolaban dene û haziriya serhildanekê dikin û dixwazin axa Kurdistanê ji dewleta Osmanî rizgar bikin. De wleta Osmanî û rêberên dewletê, malbata Osmanî, kar û şixulên dewletê, ji mêj ve, bi awayekî gelek taybetî ko hîç li ba dewleteke din nîn bû, digerandin. Osmaniyan kar û şixulên xwe bi wezîr û Paşşayên ko ji gelên bîndest ên dewleta Osmanî bûn, digerandin. Loma jî li dora

sultanên Osmanî hertim wezîr û Paşşayên ji milletên din, kurd, ereb, çerkez, laz, yewnan, bulgar, arnawit, boşnak hebûn. Bêguman van wezîr û paşayan jî kar û şixul li gora menfaetên xwe û mil- letên xwe digerlandin û ji hêzbûna wezîr û Paşşayên din hez nedikirin. Hertim di navbera wezîr û paşayan de dijîtî û berberî hebûn û ji Sultan re hevûdu gilî dikirin. Îro jî ev wezîr û Paşşayên li dora Sultan Evdilhemîd ji pîrbûn, mezinahî û quweta malbata Bedirxaniyan gelekî ditirsiyan û dixwestin pêwendiya Bedirxaniyan û Bab-i Aliyê xirab bikin. Loma jî wan li dijî Bedirxaniyan gelek tişt ji Sultan re digotin û li der û doran belav dikirin. Sultan bi tenê li wan guhdarî dikir û bêdeng dima. Kesî nizanîbû ka ew çi difikire. Lê li gora mamê Celadet Osman Paşa ko li Sarayê dixebitî û gelekî nêzîkê Sultan bû, Sultan Evdilhemîd li gotina wezîr û Paşşayên doralî guhdarî nedikir. Dîsan li gora Osman Paşa, Sultan Evdilhemîd li her derî weha digot; »Kurd û Bedirxanpaşazade birayên me yên misilman in. Em yên hev in...« Jiber vê yekê jî, îro rojêke tarîxî bû. Îro Sultan Evdilhemîd, bi vêmerasîm û nîşandanê, hem şexsî, qedrê Emîn Beg digirt û dilê Bedirxaniyan xweş dikir hem jî nîşanî herkesî dida ko kurd û Bedirxanî dostên wî ne. Lê di eynî wextê de, wî rê li ecizî û serhildanên navdar ên Bedirxaniyan digirt.

45

Celadet, di vê roja tarîxî de, bi kel û coş, li dora xwe, li Sultan û bavê xwe dinihêre. Sultan li serê salonê, li cîhê bilind, li ser textê xwe, bêdeng, çavên wî li ser merasîmê, rûniştiye. Textê wî yê zêrîn dibiriqe. Li herdu kêlekên text, kevirên lûlû û yaqûd ko bi textê zêrîn hûnandî ne, rengên têkel ên spehî didin têxt. Rûyê Sultan, rûyekî hinekî dirêj û nûranî ye. Rîh û simbêlên wî dibiriqin. Keneke tenik û bi ûsil li ser rûyê wî ye. Ew qet napeyive, bi tenê li merasîmê û li şênîyên salonê, bi aramî dinihêre. Tevî bavê Celadet bi qasî bîst kesan li kêleka hevûdu di rêzê de û nîşanên xwe werdigirin. Sultan ji textê xwe peya nabe, bi wan re napeyive, xwe nalivîne, – bi tenê serê xwe hêdîka li ba dike û silav dide wan. Hemû karên din ên

merasîmê bi destê wezîr û zabitan bi rê dibe. Hema çî bigire hemû wezîr, aqilmend û merivên Sultan bi simbêl û rîh, zabît jî tenê bi simbêl in. Rîha hinan tenik yê hinan jî bitr e. Simbêlê zabîtan jî qît î ba- dayî ye. Li salonê tiştê herî balkêş fesên Osmanî yê sor in. Li wir zeryayek ji fesan hatiye pê, li serê herkesî feskî sor ê spehî heye. Fesan, mîna helaleyên sor, hemû salon tijî kirine .

Hingê salê min deh bûn. Meraqa min pir, mêjiyê min zarok bû. Di wê sa- lona yekta de min ji kurmamê xwe Evdilrizak Beg û ji mamên xwe her dipirsî; ev çî ye, ev çî ye, ev çî ye... Wan jî bi ûsil, mîna her merivê têgihîştî, bersiva min didan; ev, ev e. Ev, ev e. Ev, ev e. Bi nerîna zarokekî dehsalî, min ew hemû tişt, avahiyên stûr, ode û salonên bedew, zêr, zîv, text, sultan, wezîr, paşa, şûr, fes, zimanê tirkî, pêwendiya wan bi min, bavê min, mamên min re di heşê xwe de nivisîn. Lê gava ez mezin bûm û pêrgî dek û dolap, êş û zehmetiyên jînê bûm, careke din ez li xwe vegeyriyam û min ji xwe pirsî; ge lo ew çî bû, ew çî bûn?.. Bêguman, bersivên van pirsên min ên cara dawîn ne mîna yê berê bûn. Şekil û sûretên ko berê di mêjiyê min ê zarok de çêbûbûn, bi temamî guherîn û qulipîn ser yê nû. Li milekî din, ew şekil û sûret, tu carî, bi her awayî, zelal nebûn... Lê belê, pêwendiya me kurdan û dewleta Osmanî (û bi dû re dewleta Tirkîyê) û pêwendiya mal- bata me Bedirxanpaşazadeyan û rêberên dewleta Osmanî her û her mîna navenda jîna min ma. Hem bi başî hem jî bi xirabî. Mîna gelek kurdên din, min jî kir, nekir, nikaribû xwe, bîr û heşê xwe, hîs û pejnên xwe jê xelas biki- ra. Di destpêka salên hezarî de eşîrên tirkan hatibûn û welatê me kurdan vegirtibûn. Ji wê rojê û vir de, em û tirk bi hev re, mîna cîran, dijiyan. Lê cîraniyeke newekhev. Ew hertim xwedî dewlet, em bêdewlet, peregende

46

û b indest. Lê tevî vê yekê jî, em di nav hev de bûn, bi hev re dijiyan, ji hev dizewicîn, bi tirkî perwerde dibûn. Ez çî bibêjim... Pêwendiya me hem pirbaş hem pir xirab bû, hem çê hem neçê bû. Ez çî bibêjim?..

47

48

FOTOGRAF 3: Galata; pira dewr û dewranê, cihê evîn û mirinê...

1

Pira Galatayê; yek ji navendên romana Bîra Qederê, hem bi çêyî hem bi neçêyî... Meriv ji ko dest pê bike? Fotografa seyemîn a romana li ser Pira tarîxî ya Galatayê ya Stembolê ye.

Fotografa reş û spî di destpêka salên 1900-an de, yanê di dema ko êdî Celadet bîr dibe de, tê kişandin. Belê, di wan deman de ko êdî Celadet der û dora xwe dinase û bi serê xwe dikare derbasî aliyê din ê Stembolê bibe...

Fotograf bergeheke xweş a Pira Galatayê nîşan dide. Hemû pir, doraliyên wê, meriv, hemal, ker, erebe, fayton tê de ne. Fotograf ji ber devê aliyê Galatayê tê kişandin. Ev ne bêsebeb e. Jiber ko kesên ko foto grafê dikişînin, li aliyê Galata yê pirê dijîn. Ew wê ji aliyê xwe dikişînin.

Fotograf bi devê pirê yê aliyê Galatayê dest pê dike û hema çî bigire, dev hemû pêşiya fotografê dadigire. Bi dû re, pir û herdu aliyên wê, her ko diçe, tengtir dibin. Li aliyê din ê Pirê, mizgeft, minareyên wan ên dirêj, qonaxên li ber avê, banên xaniyan û çend ewrên nîvreş, bi hev re, panora- mayeke spehî tînin pê. Hem însan hem jî bergeheke xweş a Stembolê di vê fotografê de dixuye. Yekîtiya însan û bajêr, kes û civatê tê de heye. Hejmara merivan pir e. Pêşî pênc nobedar û tehsîldarên pirê, pir xweş, heta simbêlê xwe, dixuyin. Sisê ji wan li aliyê çepê, yê din li aliyê rastê rawestane û di nav kincên xwe yê çk î spî de nobedarî dikin. Tehsîldarê ko li ber devê aliyê rastê sekiniye, destê xwe yê rastê vekiriye û heqê der- basbûnê ji merivekî distîne. Yê din jî, çavên wan li ser şêniyan, rawestî ne. Li kêleka tehsîldarê herî rastê, çend kes, bi kincên reş ên spehî, di destên wan de sîwanên reş, ber bi aliyê Galatayê tên. Du b arkêş, barên gi- ran li ser pişta wan, derin. Du jin, di nav kincên xweş de, li kêleka hev, derin. Du mêt, fes li serê



wan, bi dest û piyan dipeyivin û tèn. Du ker bi barên bilind û li pey wan jî du hemal tèn. Kes û komine biçûk, li herdu aliyên pirê, xwe dane ber caxên pirê û li avê dinihêrin. Li jor, du payton

49

li pey hev, derin. Dîsan li jor çend kes û çend sîwan dixuyin. Eger meriv bixwaze bihijmêre, li ser Pirê ji sed û pênceyî zêdetir meriv derin û tèn û radiwestin. Yanê hejmar, li gora pira Galatayê kê m e. ş ên

Sebebê vê kêmaniyê ev e; rojê hê nû dest pê kiriye, bajar hê baş nebûye, kar û şixul, hatin û çûyin hê baş germ nebûye. û baraneke sivik hêdî hêdî dibare. Di fotografê de destpêka lebata jiyânê û hişyarbûna bajarekî mezin heye. Baran, av, ewr, sîwan, mizgeft û minareyên dirêj aramiyekê direşîne ser wênê. Li milê din, tehsîldar, hatin û çûyin, şênî, ker, payton jî jîndareyekê didinê. Deng û bêdengî, jîndarî û aramî, bajar û însan... ev hemû perçeyên esasî yên Pira Galatayê ne. Pira Galatayê jixwe bê van nabe. Lê belê, kî dikare van li ser wêneyek û fotografekê bineqîşîne û diyar bike?

Abdullah Freres, bêguman Abdullah Fréres, yanê Evdillahên bira. Di bin fotografa siyemîn a romana de navê wan, di nav çarçeweyeke neqîşkirî de, bi tîpên mezin, heye. Ew û fotografxana wan navdar e. Herçend R. Xendamian fotografkêşê navdar ê aliyê Kadikoyê ye, ewçend Abdullah Fréres jî fotografkêşên navdar ên aliyê Galatayê ne.

Meriv dikare, bi misogerî, bibêje ko nîşana »Abdullah Fréres« , nîşana hostehî û bedewiya hunera fotografkêşînê ye. Ne bi tenê li Stembolê, lê herweha li hemû aliyên dewleta Osmanî û li Awrûpayê jî, ew navdar in.

Ew, navdartirîn fotografkêşên Stembolê ne. Ew fotografkêşên Stembolê û yên sultan, wezîr, paşa, ronakbîr, nivîskar, lewanten, jinên societé yên bajarê Stembolê ne. Nîşana Abdullah Fréres ji navê birayê mezin Abdullah şukrî Efendî tê. Navê birayê biçûk nayê gotin. Ew bi tenê »bi- rayê Abdullah şukrî Efendî« ye û ew herdu bi hev re Abdullah Fréres in.

Fotografxana wan li Beyoglu, di nav kuçeyeke teng a Beyo ðluyê de ye.

Fotografên herî spehî yên Beyo ðlu û Galatayê ji destê wan derketine û bi makînên wan hatine kişandin. Ew fotografkêşên Beyo ðlu û Galatayê ne; fotografkêşên herî hoste, herî kal û bi tecrube. Fotografxane, salona rûniştinê û studyoya wan hertim tijî meriv in. Li dîwarê salonê çend fotografên Beyo ðlu û Galatayê ko wan kişandine di nav çarçeweyên spehî de daleqandî ne. Di nav çarçeweyeke zêrhêlî de jî seneda ko wan ji Sultan Abdulezîz wergirtiye, »îrade-î seniye«, dibiriqe. Bi vê senedê ew bûne »Ressam-i Hazret-î şehriyari« û bi kêfxweşî, bi serbilindî vê payeyê nîşanî xelkê didin. Bi dû Sultan Abdilezîz re, gava Evdilhemîd dibe sultan, Abdullah şukrî Efendî û birayê wî îcar dibin fotografkêşên Hunkar... Li gora Kadikoyê, li aliyê Galata û Beyo ðluyê fotografxane û fo-

50

tografkêş hîn zêdetir in; Vucio û Fettel, Mathiu Papazyan, xwediye »Photo Phebusê Paul Tarkulyan, Theodor Bilbilidis, Constantin Sofiano, xwediye »Photo Parnassê« Gregoire Derarsene, Gülmez Frères û hîn çendîn wênekêşên din... Lê ev hemû hosteyên Galatayê wargehê milletên têkel li aliyekî, Abdullah Frères li aliyekî. Cîh û hostehiya Abdullah Frères di ser hemûyan re ye. Bi destê wan Stembol dibe bûkeke ðlu dibe bihuşteke rengîn, jinên bedew û spehî nazenîn, Galata û Beyo yên Cade-î Kebîr dibin horiyên bira. Mîna vê fotografa siyemîn a romana Bîra Qederê, hem yekseriya fotografên wan hem jî kitekitên fotografan lihevhatî ne. Hem hemû fotograf hem jî aliyê wê yê herî biçk bala merivan dikişîne. Li ser fotografa pira Galatayê ko gelek caran mîna Cesr-i Cedid, Pira Ecelê yan jî mîna pira Siratê bi nav dibe, meriv kitekitên Pira Galatayê jî baş dibîne; caxên herdu aliyên pirê û neqşên wan, çirayên neqşkirî yên li ser caxan

daçiqandî, textên raxistî yên Pirê, bizmarên textan, dûkan û gazînoyên li herdu kêlekên aliyê jor, kinc û pêşgîrên spî yên

nobedaran, kincên cûr bi cûr yên li ser şêniyên ko di pirê re derbas dibin, awayê rêûyina barkêşan. Ji fotografê û kitekitên wê baş dixuye ko pir navendeke girîng a jiyana Stembolê ya rengîn û dewlemend e. Ne bi tenê evçend; ew xwediyê tarîxeke taybetî, qedereke balkêş e. û li dora tarîx û qedera wê gelek tarîx û qederên şexsî jî hatine hûnandin. Gelek evîn li ser textên wê yên jihevketî û riziwayî hatine pê, gelek hêstir li wir barîne, gelek dil hilavêtine. Gelek ruhên şikestî ji wir li pêlên avê û ewrên aso nihêrîne. Digel tarîx û qedera Pira Galatayê, ev aliyên wê jî, ji bo romana Bîra Qederê, girîng in. Roman, bêyî pira Galatayê nabe roman. Germahiya boş a evînê, cara pêşîn, li ser pira Galatayê, ruh û bedena Celadet vedigire. airûskên hebûn û xwebûnê, ewçend bi xurtî, li wir, li dora wî, bi firê dikevin. Ew mirinê li wir, cara pêşîn, bi rûçikê wê yê saw û xoftijî, dibîne û dijî.

Belê, Galata, pira evîn û evîndariyê, xwenasîn û xwebûnê, mirin û kuştinê ye. evîndariyê, xwenasîn û xwebûnê, mirin û kuştinê, di nav dengên 2 Di vî danê êvarê yê payiza 1905-an de, pira Galatayê, Pira evîn û rengîn û heydadaneke şêrîn de ye. Bi gotina cihûyên Galatayê, eger meriv derziyê bavêje erdê, ew nakeve. Ewçend kelebalix e, ewçend şênî heye. Hin derin, hin tîn, hin rawestane. Hin diqîrin, hin dikenin, hin digirîn. Hin bi lez in, hin jî, mîna Evdilrezak Beg, Sureya û Celadet, kêfa vî danê êvarê, bi kêfxweşî dadiqultînin.

51

Ji her derî deng tê; ji merivan, ji pirê, ji textên pirê, ji erebe û paytonan, ji keştî û qayikên doralî, ji aliyên Galatayê. Bi gotina kurdên Kadikoyê, dê weledê xwe avêtiye. Roj, roja mahşerê, roja axirzemanê ye. Ziman ketine nav hev, tirkî, kurdî, erebî, romî, îtalî, fransizî, slawî, bulgarî, îngilizî rabûne govendê.

Rojeke din ji rojên bêhesab diqede. Ro, hemû giranî û westa rojê li ser milan, diçe ava. Roja payizê, bi rengên xwe yên cuda û taybetî, hêdî hêdîxatir dixwaze. Bajar û şêniyên bajêr haziriya êvareke nû dikin. Ji dûr ve, du keştîyên dûkelî, bi mij û dûmanê, xwe berdidin

nav zîkê zerya Marmarayê, çend keştiyên biçk ên bayî, xêliyên wan bi b a tijî, li ser avê, hêdî hêdî, xwe dilivînin û derin. Esmen çikî sayî ye, bi tenê tîrêjên tavê yên sor, li cîhê ko tav dere ava, rengê sor û zer dide gewheriya esman.

Li ber lingên pirê jî, masîvan di nav qayikên xwe yên biçk de, ko bi pêlên avê hêdî hêdî xwe dilivînin, hem li pey masiyan in hem jî masiyên ko girtine, li ser agirê komirê, bi gotina wan, »duqulipînin ser masiyên biraştî.« Bîhneke têkel ê boş hemû Pira Galatayê vegirtiye. Bîhna zerya û avê, masî û agir, xwîn û xwîdanê ketiye nav hev. Bîhna lewantên xanimên Galatayê û xwîdana hemalên Stembolê bûne yek, bi hev re dimeşin... Celadet ko êdî bûye donzde salî, ji d anên êvarê yên Galatayê pir hez dike.

Avaçûna rojê, bi reng, tahm û bihnên xwe, xwe berdide nav ruh û canê wî. Ew dixwaze her danê êvarê li vir be û bi çavan bibîne, bi guhan bibi- hîse, bi dil û ruh hîs bike. Kekê wî Sureya ew hînî »nerîn, bihîstin û hîskirinê kiriye. Mîna vî danê êvarê, pirî caran jî ew bi hev re tîn Galatayê. Ev deng û şênîyên têkel, ev reng û bîhnên têkel, ev sûret û bergehên têkel kela dilê xort ê Celadet hildide, kêf û coşeke taybetî didiyê. Gotinên straneke barkêşekî, qîrîna zarokêkî, dengê xêliya keştiyekê, bîhna masiyê biraştî, wîcewîça teyrekî avê, kincê neqşkirî yê xanimêkê, simbêlê badayî yê tehsîldarekî, fesê sor ê begzadeyekî... ev hemû dibin rengên jiyana wî ya ciwan. Yan jî meriv dikare weha bibêje; ev hemû ruh û jiyana wî ya ciwan dineqîşînin.

Vî danê êvara payiza sedsala nû, Celadet tevî kurmamê xwe Evdilrezak û kekê xwe Sureya, li ser Pira Galatayê, li ber caxên pirê sekiniye û deng û bîhnan werdigire. Kekê wî Sureya ko ji niha ve, di vê xortiya xwe de, bûye xwediyê rû û zîkekî gulover, li nêzîkê Pira Galatayê, li dibistana herî navdar a dewleta Osmanî Mekteb-i Sultani dixwîne. Jiber nêzîkahiya dibistanê, gava Celadet ji Kadikoyê dadikeve vî aliyê Stembolê, ew tê

dibistanê û ji wir, herdu bira, bi hev re tèn ser Pira Galatayê. îro kurmamê wan Evdilrezak, »mutercîm û teşrîfatçiyê« Sultan Evdilhemîd, koji wan pir mezintir e, bi wan re ye. Wî xwestiye herdu birayan b ibîne. Wî nivîsareke direj li ser tarîxa kurdan û tarîxa Bedirxaniyan nivisiye û dil dike nivîsara dirêj nîşanî Sureya ko ji nivisînê hez dike, bide. Ew ê b i hevre, bi keştiyê derbasî aliyê Kadikoyê bibin û Evdilrezak Beg ê îşev bibê mêvanê wan. Lê berî çyinê, pêşî Galata divê, bêyî Galatayê divê roja Stembolê neqede!.. hersê kurmam, hersê Bedirxanî, sê metelikên xwe dane tehsîldaran, derbasî ser pirê bûne û niha li doralî temaşe dikin.

– Galata, pira dewr û dewranê ye, Evdilrezak Beg, bi tiliya xwe, li aliyê din ê pirê, paytoneke şikestî nîşan dide û ji kurmamên xwe re dibêje. Tiştên ko li ser vê pirê qewimîne, ne şixulê hesab û gotinê ne. Tekerên gelek paytonan, çpên gelek ker û bergîran, lingên gelek beg û xaniman, stûyê gelek hemal û barkêşan li vir şikiyane. Bizmarên textên raxistî jê derdikevin, text radibin û her cara ko pir ji bo çyin û hatina keştiyan, bi şevan, vedibe, hemû dûzana wê xirab dibe. Sîwanek û du bastonên min bi xwe li ser vê pirê şikiyane. Lê eger ew neşikiyabûna, niha yan lingê min yan jî stûyê min şikestî bû. Taximekî kincê nû yê reş li ser Evdilrezak Beg e. Simbêlê wî badayî, porê wî şehkirî ye. îro wî fes nedaye serê xwe. Bejna wî d irêj, bedena wî lihevhatî ye. Tevî ko umrê wî ji Sureya gelekî mezintir e, ew ji wî ciwantir dixuye. Celadet hem ji kekê xwe hem ji kurmamê xwe hez dike. Ewxwe bi wan re pir kêfxweş û serfiraz hîs dike. Ji wan tiştên nû hîn dibe, jiyane dinase, bîr bi qîmeta zanîn û perwerdeyiyê dibe. Celadet, di navbera herduyan de, destên wî li ser caxan, bi kêfxweşî li avaçûna tava sor û tîrêjên wê yên bêare û jar dinihêre.

Gotina te rast e; min ji wan hez dikir. Gotina te aliyekî rastiya min e; kekê min Sureya û kurmamê min Evdilrezak ko ji bo min mamekî yekta bû, ji wan kesên ji bo min bijarte bûn, ko min ji wan hez dikirin. Ew hem hevalênmin, hem mamostayên min bûn. Ez ji wan hem hînê kêf û henekê hem îlim û zanîne bûm. Bi xêra wan dîqet û

haydariya zaneyan, jîrî û zîrekiya şer- wanan, nermahî û henûniya delaliyan, serhildan û berxwedana bîrewer- an, daxwaz û xwesteka xortan, girîn û nalîna belengazan, tahm û bîhna deman ketin jîna min. Rê li ber min vebûn, deriyên dilê min ji bo rengên aso û keskesorê vebûn. Pêlên evînê bi ser min de hatin, ez bi ser pêlên windabûn û mirinê de çm. şer û pevçn, berberî û dijîtî, derketî û xerîbî,

53

zîzî û melûlî, stran û şîr, av û bîr, êvar û şev bûn para jîna min. Ew bûn qed- era min. û li ser riya qedera min, kekê min û kurmamê min her bi min re bûm. Carina ew bi xwe, carina siya wan. Gotina te rast e; min ji wan hezdikir...

Di nav dangan de dengêkî, ji nêz ve, tê guhê wan, – Pis Kürd, alçak... Ew hersê, bi carekê, serê xwe dizivîrînin û li paş xwe dinihêrin. Li paş wan, li ser pirê, hema çend gav bi dûrî wan, barkêşekî simbêlqît, bar li piştê, ketiye erdê, lingê wî yê çepê heta ber çogê ketiye navbera du textênpirê. Ew dike, nake, nikare lingê xwe jê derxe. Barê piştê wî li erdê belav bûye. aend kîsên kaxizî ketine erdê, sêv, porteq al û sewzên tê de jê pê- gizîne û belav bûne. Ew li milekî dixwaze linge xwe rizgar bike li milekî jî dixwaze xwe bi meywe û sewzên belavbûyî bigihîne û wan berhev bike. Ew bi dengêkî bilind, bi kurdî, dinale. Merivekî rîtenik, bejndirêj û kincxweş li ser wî sekiniye, diqîre ser wî û bi bastonê destê xwe zextan didiyê. Keçikek bejndirêj ko di umrê Celadet de ye, bi tirs û xof, li kêle- ka mêrik rawestayê û dixwaze alîkariya barkêş bike. şênî hêdî hêdî li ser wan kom dibin. Merivê rîtenik diqîre û dide xeberan.

Evdilrezak Beg û Sureya hema xwe bi barkêş digihînin. Evdilrezak Beg, bi leza birûskê, destê xwe yê rastê hildide û destê xwe yê vekirî, bi hemû quweta xwe li ser rûyê merivê rîtenik dixîne.

– Pis ve alçak sensin, utanmaz adam!.. Kes fahm nake ka çi bû. Merivê rîtenik, bi lez û quweta gurmista

Evdilrezak Beg, dikeve erdê û li ser barkêş gêr dibe. Keçik jî diqîre, dibe »baba, baba«ya wê û ew xwe davêje ser mêrik. Celadet bi

tesîra bûyerê di- heje. Dilê wî bi barkêş, merivê rîtenik û keçikê dişewite. Xelk li dora wan dicivin, ji çavên kurmamê wî agir diçirûsin. Ew bi hêdîka destê xwe davê- je pişta keçikê û wê radike. çavên wê bala Celadet dikişînin; coteke çavên badem bi şewqeke boş dibiriqin. Sureya û hinên din jî merivê rîtenik radikin û barkêş ji wê rewşa neçar rizgar dikan.

– Menşeyînden dolayi, bir insana nasil hakaret edebîlîrsînîz? Utanmıyor musunuz?

Hêrsa Evdilrezak Beg daneketiye. Merivê rîtenik xwe dide hev, pêşî li Evdilrezak Beg, Sureya û Celadet dinihêre paşê jî li dora xwe. Ew keçika kêlekê ber bi xwe dikişîne û porê wê mist dide.

– Özüür dîlerîm, Abdulrezzak Bey, sînîrlîlik halîmle, haddîm olmadan telafuz ettim.

54

Mêrik ji Evdilrezak Beg dixwaze ko ew lê bibore, bi demargirî wî hin tiştên tewş gotine. Ew Evdilrezak Beg û Sureya nas dike. Ew jî li aliyê Kadiko yê dijî û cîranê mamê wan Murat Beg e. Navê wî Ali Siûd e, keçika li kêlekê, keça wî Canan e. Canan, bi çavên xwe, bi beden û endama xwe, bi evîn, jiyana û serpêhatiya xwe ya balkêş, li vir, li ser pira Galatayê dikeve nav rûpelên Bîra Qederê. Awirên wî li ser çavên keçikê, jiber tesîra bûyerê, bêdeng, Celadet li dora xwe dinihêre.

3

Awirên wî li ser çavên zabit, ji ber tesîra bûyerê, bêdeng, Celadet li dora xwe dinihêre. aend zabît û gelek esker vî danê êvarê yê xweş û aram ê 1906-an , hatine mala Emîn alî Bedirxan. Piraniya wan li bexçê û dora malê ne, du zabît û du seresker jî hatine hundir û bi rêzdarî, li salonê, bi Emîn alî Beg re dipeyivin. Celadet û Kamuran jî li nik bavê xwe ne. Jin li aliyê mitbaxê ne. Emîn alî Begê ko ji mêj ve bû, li benda vê rojê bû, bi aramî, li zabitê ko pê re dipeyive, guhdarî dike.

Belê, ew roj hatibû, roja ko di jiyana Bedirxaniyan û Celadet de rûpeleke nû ye û rûpelên romana ber bi cîh, war û diyarên nediyar

dibin. aare nîn bû; ew roj dê bibûya perçeyekî qedera Celadet û rûpelên Bîra Qederê... Zab itê li pêşiyê rawestiyayî ji Emîn alî Beg re se- beba hatina xwe îzeh dike. Di destê wî de jî kaxizeke zer û dirêj heye ko liserê biryara Sadrazam a sebeba hatina eskeran hatiye nivisîn. Zabit b i rêz- darî biryarê dide Emîn alî Beg. Emîn alî Beg, tiliya mezin a destê çepê liser simbêlê wî yê şehkirî, li biryarê dinihêre. Di binê biryarê de mohra nasa Sadrazam heye. Kêliyeke dirêj, ew li kaxizê dinihêre û difikire, paşê ew li Celadet û Kamuran ko hema li kêleka wî ne, dinihêre, bêyî ko tiştêkî bibêje yan jî bide diyarkirin...

Heke te îzin hebe, bihêle, ez bi xwe behsa wê rojê bikim. Min ew roj dît, lê te bihîstiye û li serê xwendiyê. Dîtin û xeyalkirin ne mîna hev in. Bihêle, çavên ko ew roj dîtine, bila bi zimanê bûyerê (ne bi zimanê romanekê) behsa wê rojê bikin... Fermana me rabûbû. Roj, roja fermanê, fermana me kurdan û Bedirxaniyan bû. Riyên welatên dûr û nenas, dîsan, li ber me ve- bûbûn, dîsan me dê xatir bixwesta û berê xwe bida welatên xerîbiyê. Hingê, wê rojê, salê min sêzde, yê Kamo yandzde bûn û diya min, piştî Hîkmet, Tevfîk, Safter û Meziyetê, zarokêkî nû dipa. Hingê, di wan rojan de, êdî haya min ji her tiştî hebû û bejn û bala min di cîh de bû.

55

Ew roj, tevî her kitkitê, tê bîra min. Her tişt bi mirina serekê belediyê, bi gotina hingê, şehremîniyê Stembolê Ridwan Paşa dest pê kiribû. Danekî êvarê, li aliyê me yê Stembolê, Kadik oyê, Ridwan Paşa ji aliyê çar kurdan, bi demanç, hatibû kuştin. Kurd, kurdên me bû n. Hatin û çyina wan a malên me, bi taybetî mala mamê min Alî şamîl Paşa hebû. Alî şamîl Paşa, bi dû kuştina Ridwan Paşa re, li wan kurdan xwedî derketibû. Ridwan Paşa... Ridwan Paşa-yê ko bû sebeba fermana me, mîna gelek kargerêndewleta Osmanî ko ji milletên din dihatin, dijminahî li me Bedirxaniyan dikir. Sadrazam hingê arnawid bû. Ew ji giranî, tesîr û nifûza Bedirxaniyan ali ser dewletê û Siltan Evdilhemîd ditirsiyan û li pey dek û dolaban bûn. Hemû Bedirxanî, lê berî hemûyan jî kurmamê min Evd ilrezak



û mamê min Alî şamîl Paşa stiriye çavên wan bûn. Evdilrezak Beg, bi gotina hingî, »Mabeyn mütercimî ve şûra-yi Devlet Azasi« bû. Alî şamîl Paşa jî kuman- darê qışla eskerî ya Selîmiyê, skûdarê û cîgirê »Hazretî şehriyari« bû. Yanê li Stembolê gotina wan ferman, kirina wan qanûn bû. Ango ew li ber wezîr, paşa û kargerên mezin ên dewleta Osmanî kosp bûn.

Herkesî bi dijîtî û dijminahiya Evdilrezak Beg û Ridwan Paşa dizanîbû. Lê gava Evdilrezak Beg konaxa xwe ya şîşli-yê ava kir, dijîtiya wan hîn kûrtir bibû. Evdilrezak Beg dixwest rê heta ber mala wî ya nû were. Ridwan Paşa »şehremînî« bû, riya ko Evdilrezak Beg dixwest, nedida çkirin... aîrokeke evçend basîd bi vî awayî dest pê kir û dirêj bû. Teşqe, qîreqîr, şer û pevçûn li pey hev hatin û di dawiyê de jî, gava Ridwan Paşa û kurê wî Reşad, danekî êvarê, ji trêna Goztepeyê peya bûn, Ridwan Paşa bi heyşt guleyan kete erdê, ser axa rehmetê. Ew heyşt guleyên ko li canê Ridwan Paşa ketin, bûn sebebên fermana me jî. Wan heyşt beîkan fersendeke welê da destê Sadrazam û neyarên din ên kurdan ko êdî tu kesî nikaribû rê li dek û dolabên wan bigirta. êdî rê vebûbû; ew ê bi ser ketina, em ê jî ber bi sirgûniyê biçna... Siltan Evdilhemîdê ko nîşan dabûn bavê min, mam û kurmamên min parastibûn û gotibû ko kurd û tirk bira ne, mohra xwe li bin biryara sirgûna me xist. Ne bi tenê Evdilrezak Beg, Alî şamîl Paşa û kesên ko Ridwan Paşa kuştibûn, dê biçna sirgûnê, em hemû, belê em hemû Bedirxanî dê biçna. Ne bi tenê Bedirxanpaşazade, lê çî kurd ê ko bi awayekî pêwendiya wî û wê bi me re hebû, dê biçya sirgûnê. Ne bi tenê ew jî, cîran, heval û dostên Bedirxanpaşazadeyan jî dê biçûna. Kerwana sirgûnê pir dîrêj bû. Em Bedirxanpaşazade bi qasî sedû şest kesî û kurdên ko bi me re têkiliyên wan hebûn, bi qasî sê hezar kesî, belê, sêhezar kesî, diketin ser riya welatên dîr. Em ji welatekî xerîbiyê ko lê hatibûn bicîhkirin, dîsan, diçûn welatekî din ê xerîbiyê. Bi gotina bavê min, »dewrafelekê li ser me kîn bû«, em lawê n welatê xerîbiyê bûn, xerîbî qedera me bû.

Eger em dîsan werin ser wê rojê, zabitan wezîfa xwe dikirin; wan biryara fermanê ko bavê min bihîstibû, ji bavê min re gotin. Em ê heta sibê hazir bûna, wan ê jî li ber deriyê bexç nobet bigirtana û berbanga sibê, em ê di bin çavnêriya wan de biçna Galatayê. Belê, riya welatê nû yê xerîbiyê ji Galatayê dest pê dikir; ew herdu keştiyên ko dê me bibirana sirgûnê, keştiya »Mekke« û »şewketî Derya« li wir, li benda me bûn. şewket-î Derya, keştiyeke navdar bû, li Stembo lê herkesî navê wê bihîstibû. Ew keştiyeke kevnare ya sirgûnê bû. Ji mêj ve bû ko wê muxalîfên dewleta Osmanî û Siltan Evdilhemîd dibirin welatên germ ên mixrib û ereban, cîhê sirgûn û windabûnê. Niha jî ew keştiya navdar û ya Mekkê ko jê nûtir û çtir bû, ji bo me hatibûn hazirkirin.

Hin ji mamên min li Stembolê dijiyan, lê hinên wan jî li derveyî Stembo lê. Gelek kesên ji malbata me ya fireh, bi wezîfên cihê yên dewleta »Osmanî alî«, li deverên cihê dijiyan. Lê biryara sirgûnê ji bo me hemûyan bû û her kesê ko Bedirxanpaşazade bû, diviya, bi gotina biryarê, li cîhê xwe »derdest« bûya. Evdilrezak Beg û Osman Paşa li Mabeynê, çend gav ji Siltan Evdilhemîd bi dûr, hatin girtin. Alî şamîl Paşa li Qışla Selîmiyê, Husên Kenan Paşa li Yozgatê, cîhê ko ew lê miteserif bû, Kamîl Paşa li Hayfayê, Mihemed Elî û Mehmûd Beg li Beyrûdê, Mîthed, Murad, Hesên, Evdirehman û Bedrî Paşa li malên xwe hatin »derdest« kirin. Kekê min Sureya jî li xwendegehê, Mekteb-î Sultaniyê... Ew Mekteb-î Sultaniye ko mektebeke bijarte bû û serek û kargerên pêşerojê yên Dewleta Osmanî alî digihandin û hema çî bigire cîhekî muqedes bû, wê rojê tijî esker û zabîtan bûbû, ji bo kekê min.

Heye ko haya te jê hebe, di wan rojên sirgûnê de, kitêbokek bi navê »Emîr Bedirxan« d erket. Kitêbok ji aliyê zanayên kurdên Stembolê û bi îmza »Lutfî« weşiya. Li wir behsa kuştina Ridwan Paşa û sirgûna me jî dibe. Hingî li ser kuştin û sirgûnê gelek tişt di cerîdeyên osmanî û fransîzî de hatin nivisîn. »Le Figaro« bi dirêjî li ser bûyerê nivisî. Kurdan jî bi kitêbokê bûyer îzeh kirin û Siltan mîna

curimdarê vê sirgûna ko mala gelek û gelek kurdan şewitan, îlan kirin. Herwekî ko wan jî digot, sirgûn, ne ya çend ke- san bû, ew ya zar û zêç, kal û pîr, jin û pîrejina bû. Sirgûn, ne ya cezakinakuştinekê û mêrkujan bû, ew a kavilkirina malan, şewitandina dilan bû.

57

Sirgûn, sirgûna me kurdan bû. Galata dê îcar jî bibûya şahîda bûyereke nû ya tarîxî; Galata, pira evîn û evîndaran, şahîda tarîx û bûyeran, pira ko min jê ewçend hez dikir, dê niha li pey me, li pey keştiyên ko dê ji Marmarayê ber bi Zerya Spî giran giran xwe li ba bikirana, zikê avê biqelişandina û em, bi sedan meriv; zarok, jin, kal, pîr, paşa, zabit, karmend, xwende, bibirana deverên dûr, wê dê desmal hilda û bi zîzî strana veqetîne bigota.

Di berbanga dotira rojê de Galatayê destmal hilda. Kayiqên eskerî hatin û em birin keştiyan ko hinekî ji Galatayê dûr lenger avêtibûn û li benda me bûn. Ez çi bibêjim?.. Galatayê strana zîz a veqetîne digot... dewra felekê li ser me kîn bû...

4

«Dewra felekê li ser me kîn e / Bextê me reş e, kezeb birîn e; / Mesken ji me re niho nivîn e, / Binve kezeba min binve lo! lo!..» Li bajerekî dûr, pir dûr, Akkayê, di keleheke kevn û qaîm de, li bexçeyekî biçk, Emîn alî Bedirxan li kêleka bîra bexç rûniştiye. Li lawê xwe yê biçûk Bedirxan ko li ser ejnûwên wî dirêj bûye, dinihêre. Jina wî Samîha Xanim û zarokên wî, ji Sureya pê ve, li dora wî ne. Bedirxan hê zarokê berşîr e. Ew zarokê sirgûnê ye, li sirgûnê hatiye dinê. Di vê jiyana nû ya dijwar a sirgûnê de bi tenê bûyina wî kêfxweşiyek daye malbatê. Bi gotina Emîn alî Beg, di sala 1906 - an de, divê bi tenê bûyina Bedirxan bi bîr were. Ne tiştêkî din, ne bûyereke din. Hatina Bedirxan şênahiyek û kêfxweşiyek xiste nav zarokan. Samîha Xanim pê şa bû, zarok pê bûn xwediyê kahniya kêf û lîstikê. Emîn alî Beg jî li serê şîr nivisîn û Mezoya biçk, keça malê, Meziyetê jî li dorê, bi zimanê xwe yê hûrik û şêrîn, stran gotin.

Niha, di vê roja payiza 1906-an de, Bedirxan nexweş e. çavên wî venabin. şênahî û kêfxweşiya malê, bêhal bêhereket, mîna çira ber destê sibê, vedimire. Ji dengê zîz ê Meziyeta biçk pê ve, tu deng dernakeve. Bi tenê ew, li kêleka bavê xwe, li »Berxo« dinihêre û hêdî hêdî şîira bavê xwe dine- hwirîne. Di jiyana kesertijî de, vî danê êvarê jî, li kêleka bîrê, dîsan keser heye.

Jiyana sirgûniyê ya Emîn alî Beg û mala wî, piştî rêwîtiyeke dijwar, di keleha bajarê Akkayê de dest pê kir. Bedirxanî her yek bi derekê de hatin şandin. Keştiyan ew, mîna pelên p ayizê ko yek bi yek ji darê diweşin, li dever û bajarên nenas peya kirin; Evdilrezak Beg, Alî şamîl Paşa, Osman

58

Paşa, Mithed, Hesên, Xelîl Beg li Trablusgarbê hatin peya kirin û zîndankirin. Yê din jî li Rodos, Nablus, şam, Akka, Yemen, Tayif û hin bajarên din hatin belavkirin. Cîhê jiyana sirgûniyê ya Emîn alî Beg û malbata wî bajarê Anatolîyê Sparte bû. Ew li keleha Akkayê, di bin çavnêriya ordiyê de, li benda çyina Spartayê man. Rêwîtiya wan dewam dikir. Lê jiyana, jiyana bû. Jiyana nû li rêwîtiyê guhdarî nedikir, Bedirxan, di berbangê de hatibû û bûbû pardarê jiyana wan. Bi hatina wî re, Emîn alî Begê jî dest pê kiribû, piştî nîvroyan, li kêleka bîra bexç rûne û şîiran li ser »berxê xwe« binivîse. Tu tiştê ko wan di wê kelehê de bikiranîn bû. Piştî nîvroyan Celadet û Kamuran ji bîrê av dikişandin û pê bexçe av didan, kursî û masa bavê xwe tanîn û li kêleka bîrê datanîn.

Samîha Xanimê jî sêv û porteqal perçe dikirin, ew dikirin sêniyekê biçk û datanî ser masa mêrê xwe. Hîkmet, Tefîk, Safer û Mezo jî bi Bedirxan re dilîstin û ew dilorandin.

Lê niha Mezo dinehwirîne; »Ne mal û ne saxî û ne rahet, / Talan kirine hemî ji mîhnet; / Dijwar e gelek belayê xurbet, / Binve kezeba min binve lo! lo!... Hewqas tu mebêje ev çî hal e / Bê sebr mebe welê menale; / Ewn û kerema Xwedê heval e, / Binve kezeba min binve lo! lo!...« Ew hem di - girî, hem dibêje. Samîha Xanima ko li kêleka mêrê xwe rûniştiye, jî bêdeng digirî. Vî danê êvarê ji bîrê av

nehatiye kişandin, Ceco û Kamo bexçe av nedane, li ser masê sêv û portakal nîn in, kes li esmanan nanihêre, teyr li esmanan naxuyin.

Bedirxan, Berxoyê mala me, mir. Li ser ejnûyên bavê min, bi dengê zîz ê xweha min... Xurbet bû, jîneke dijwar û kirêt bû, bêgavî û bêçaretî bû. Şîra bavê min ko navê wê »Delaliya Zarowan « bû, lorînek bû, qîrînek bû. Dengekî nerm mîna hewreşîm, xurt mîna pola bû ko li dijî bêgavî û bêaretiyê bilind dibû. Bi dû re, sala 1932 -an, min ew şîr di HAWAR'ê de weşand, tevî nivîsareke kurt. Navê nivîsarê »Loriya Bedirxan« bû. Di şeveke ronî ya havîna germ a şamê de, ez firiyam û çûm nik bav û bapîr, dê û bîrayê xwe Berxo û min ew nivîsar nivîsî. Min di nivîsarê de weha digot;»Bi vê loriyê ne bapîrê min Bedirxan, lê neviyê wî, birayê min Bedirxan dinivîrand û dilorandin. Ev loriya ha ko bi xwe, bi ziman û mana xwe ve hêja ye, ji bona min, ji hêleke din bîreke mezin û zelûl e. Pê bapîr, bav, dê û birayê min -ko her car ji zûda gehîştine rehmeta Xwedê- têne bîra min. Ji ber ko Bedirxan navlêkirî ye, tê de navê bapîrê min heye. Ew Bedirxanê ko bi xurtî û mezinahiya xwe ve navê xwe, li şûna navê mal-

59

batekê xistiye. Ew Bedirxanê ko ji bona yekitiya Kurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tiştên xwe di vîriyê de feda kiriye û ji bona wê jî miriye.

Ev lorî bavê min ji birayê min re gotiye. Ew bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên b akurî ho nik dibû û di Cizîrê de di nav germiya lat û zinarênBurca-Belek de dikeliha û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji sîngêndahatiyên malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayên wan vedimîzt -lê ez ji dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê riya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.

Ev lorî, diya min distrand û pê birayê min dinivîrand. Ev diya ko gava ez hejdeh, niwanzdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba herbiyê, ji min re gotibû: -Ma ji te re ne namû s e? Tu çawan bikevî mekteba herbiyê û bîbî zabitê tirko. Ev tirko ko welatê te ji destê

te standine, miletê te xis- tine xulamiyê, bapîrê te dîl û malbata te pêrîşan kirine û hon avêtine zî- varyê.

Ev loriya ha ji birayê min ê kiçk Bedirxan re dihat gotin. Ev birayê ko Xwedê di menfayê de da û di menfayê de standibû. Ev birayê kiçk û delal ko di nav sê çar saetan de ser ejnûwên bavê min, di keleha Akkayê de mir...«

Bibore ko min weha dirêj kir. Lê carina veguhezandina nivîsarên kevn dikarin xweş alîkarî li yên nû b ikin û saloxdanên çtir bînin pê. Xwîdan li ser eniya Emîn alî Beg civiyaye. Ew li lawê xwe yê biçk d ini- hêre. Bi destê xwe yê rastê serrûyê lêwik, bi hêdîka, mist dide. Dilopên xwîdanê û giryê bi ûsil dikevin nav hev. Dilopên avê yên li ser kevirên bîrê, bi aramî û rêzdarî, hevaltî li dilopên din dikin. Kerba bêaretî û kesera veqetîne, bi ûsil, dilên li dora bîra keleha Akkayê diguvişînin. Bîra bêdeng ko bûye pard arê jiyana rojane ya dilên derketî, niha jî, bi ûsil, bi wan re li şîne rûdine.

Emîn alî Begê, niha jî, bi ûsil, bi wan re di şîne de ye. şî ji malê kê nabe. Her gav ew xebereke nexweş dibihîsin, xebera mirina 5 Bîra bêdeng li Spartayê ko bûye pardarê jiyana rojane ya mala yekî hezkirî bi wan digihê. Digel ko malbata Bedirxanî li her aliyên tixûbên dewleta Osmanî hatine belavkirin, ew xeberên xwe digihînin hev. Xeberên jiyana menfayê, xeb erên keser û hesretê. Berî niha bi du rojan, di vê zivistana 1907-an de, xebereke nû ya nexweş gihiya wan; Alî şamîl Paşa li zîndanên Trablusgarbê wefat kiriye.

60

Emîn alî Begê her xeberên nexweş ên Alî şamîl Paşa û Ebdilrezak Begê dibihîst. Dewlet bi taybetî li ser herduyan disekinî. Jixwe Ebdilrezak Beg bi îdamê hatibû cezakirin, lê di deqa dawîn de Padîşah cezayê wî quli- pandibû ser hepsa muebed. Herç jiyana wan a zîndanê bû, gotin têrî kirêtî û diwariya wê nedikirin. Ebdilrezak Begê, bi alîkariya zabitekî dostê wan, xeberên xwe yên zîndanê bi »dinya derve« gihandibû. Li gora vê xeberê, ew di odeyeke tarî de hatibû zîndankirin, wî, bi mehan, ji nobedarê ko jê

re xwarin tianî pê ve, tu kes nedîtibû, ew derneketibû derve, odeya wî ya zîndanê ewçend tarî bû ko wî roj û şev tevî hev kirine, mişkên mezin bûne hevalên wî yê zîndanê. Rewşa girtiyên din jî, kêzêde, weha bû.

Dilê Alî şamîl Paşa yê maxrûr û serbilind dê çawan li hember vê rewşa nizm û kirêt xwe rabigirta?.. Mirina Alî şamîl Paşa bû darbeyeke xedar û mîna zompekî giran, li ser sînga Emîn Begê ket. Alî şamîl Paşa kekê wî bû, bi dû Hemîd Tellî Begê re, mezintirîn lawê Mîr Bedirxan bû. Ji ber ko Hemîd Tellî Beg kor bû û ji wan bi dûr, li şamê, dijiya, mezinê malbatê li Stembolê Alî şamîl Paşa bû. Ew nexwende, lê bîrewer û xurt bû.

Qehremaniyên wî yê şer û pevçnan li ser zimanan bû. Mîr Bedirxan, malbata Mîr, Bedirxanîbûn, welatê bav û kalan Cizîra Botan her tiştê wî bû. Lê wî niha çavên xwe li welatekî pîr dîr, di zîndanekî tarî de girtibûnû dewletê rê nedabû ko meytê wî bişînin Cizîra Botanê yan jî Stembo lê. Ew mîna kesekî bênas, bêheval, bêkes, bêpişt, li axeke nenas hatibû veşartin. Şîna wî nehatibû girêdan, xwişkên wî di şîna wî de li ser xurtiya wî nelorandibûn, birayên wî li ser gora wî fatîhe nexwendibûn. Ew her yek li derekî belav bûn. Bi taybetî jî vê yekê Emîn alî Beg gelekî diêşand.

Niha ew li şîna birayê xwe rûniştibû. Bi kê re? Hema bi tu kesî re. Li Spartayê, hema çî bigire, qet nasên wan yan jî kurd nîn bûn. Bi tenê li derveyê Spartayê, nêzîkê Yalvaç û Gelendostê çend malbatên kurd hebûn. Berî niha bi 50-60 salan, di navenda 1800-an de, ew ji deverên Hakkarê hatibûn sirgûnkirin. aaxa wan bihîstibû ko Emîn alî Beg, lawê Mîr Bedirxan, hatibû Spartayê, ew hema hatibûn serdana wî. Pêwendiyên wan û Emîn alî Begê bi hev re hebûn. Niha jî di şîna Alî şamîl Paşa de, ew derin û tîn mala Emîn alî Beg.

Mala ko Emîn Alî Beg û zarokên wî tê de dijiyan, di navenda Spartayê de, maleke du qatî û bi bexçe bû. Kes û nasên wan li bajêr nîn bûn. Emîn

alî Beg hertim li malê bû, bi tenê carina diçû »Tüccarlar Külübü« ya ba- jêr û li wir ji eşraf û begên bajêr kesin didîtin û bi wan re li ser hal û hewalê dewleta osmanî û bûyerên rojane dipeyvî. Dewletê her meh maeşekî biçûk didayê û malbatê bi wî maeşî, bi zehmetî, debara xwe dikir. Gava ew nû hatibûn Spartayê û ev xanî peyda kiribûn, hingê xanî ne ewçend tekûz bû; bexçe xirbe, bîra li bexçe miçiqî û devgirtî, kevirên nerdewanên herdu qatan şehetî, siwaxa odeyan rijiyayî û her der gemarî bû. Avakirina xênî ji bo malbatê bû meşgaleyê baş. Tevî du karkerên ermen ên bajêr, wan di nav çed mehan de mal kirin mîna qesrekê. Banê xênî ji nû ve hate raxistin, siwaxeke spî li dîwaran hate reşandin, mitbax bi carekê lêbû, serşokeke nû çêbû, kevirên pêpîlokên nerdewan bi kirêca spî hatin qaîmkirin, devê bîrê vebû û gemariya tê jê hate derxistin û bîr ji nû ve hate vejandin û bexçe bû bexçeyekî kesk û şîn, tê de lemên xiyar, qitik, firengî, îsot û bacanan bejn avêtin. Di av akirina van hemû tiştan de Celadet û Kamuran mîna du mûriyên karker her alîkarî li karkeran kirin û bi şev û roj xebitîn. Heta katekê Hîkmet jî alîkariya wan kir.

Wan li Akkayê, li kêleka bîrekê, jiyaneke pepûk winda kiribûn. Lê bîra mala wan a Spartayê jiyana dida bexçe. Karkerên ermen dora devê bîrê bi du qor kev irên nehî, pir xweş, mîna birceke kelehekê lêkiribûn, bîreke genî û xetimî qulipandibûn ser avahiyeke spehî.

Tu dizanî, gotineke birayên me aşuriyan heye, dibêjin, »Ava bîran bi tedbîr e.« Me jî ava bîra xwe bi tedbîr bi kar tanî, lê digel vê, wê têra her tiştê me dikir. Destê bavê min pir teng bû. Bi xêra bîrê, me sevizên malê hemû li bexçe diçandin. Em li Spartayê mêvan bûn. Em ê, îro, sibê, biçûna. Lê belê, herçend em mêvan bûn, ewçend jî em li wir dijîyan. Bavo û me jîneke ro- jane diviya. Menfa bêyom bû, xeber nexweş bûn, li bajêr xêrxwaz kêmbûn, best û kêf nîn bûn, coş dûr bû. Bi kurtahî, jîn xerîb bû, jîna xerîbiyê bû. Digel vê hindê, ew jîn bû. Sparte bajarekî kevnare û biçûk ê têkel bû, tê de tirk, rûm û ermen hebûn. Hin dibistanên tirk, ermen û rûman li bajêr hebûn. Ji nav wan dibistana Aramyan a ermenan hem pir xweş hem



jî navdar bû. Me di dibis- tanên tirkan de dest bi xwendinê kir. Li malê jî bav û diya min û şehriban ko bi me re hatibû, tevî bira û xweha min, rojên wekhev li hev zêde dikirin. Herwekî te got, hin mal û eşîrên kurdan jî li der û dorên Spartayê hatibûn cîwar kirin. Carina bavê min diçû serdana wan. Gava çûyina wî dihat rojên îniyan, ko hingî em nedîçûn dibistanê, ez û Kamo jî pê re diçûn. Em ji Deşta

62

Spartayê dibihurîn û diçûn nav eşîrên kurdan, konên wan ên reş. Carina jî bavê min hemû mal bi xwe dibir seyrangehê, Gola Kovada û Geliyê Aksu. Li dora Golê darên kevn, qehîm û xweş ên gwihîz, bî û spîndaran hebûn. Me mehfûrên xwe li binê daran radixistin, xwarinên ko diya min û şehribanê hazir kiribûn, derdixistin û ew dixwarin. Mîna niha tê bîra min; hingî bavo piştta xwe dida darekê û rojname û kitabên xwe dixwendin. Mezo jî bi dengê xwe yê xweş stran digotin. Ez û Kamo û Hîkmet li nav daran digeriyan û Tevfîk û Safter jî li dora diya min û şehribanê dibezîyan.

Îro hin serekeşîrên kurdan hatine û sersaxî ji Emîn alî Beg û kurdan re dixwazin. Ew li kêleka Emîn alî Beg li ser doşek û mehfûrên rengîn rûniştine, qahwa tahl vedixwin û dibêjin; – Bila serê we, serê me, serê kurdan sax be. Rehma xwedê lê be, Alî şamîl Paşa, lawê mîrê me yê mezin î gorbehîşt çûye rehmetê, lê ruhê wî yê şad bijî. Li menfayê şîn dijwar e. Lê menfa mêvanî ye. Qey Xwedê dê rojekê vegera me jî bike nasîbî me. çavê me li rê, li benda wê rojê ye...

6

Xwedê ev roj jî kir nasîbî me, çavê me li rê, li benda vê rojê bû... Ji kêfa Amojna Sitî re payan tune. Emîn alî Beg, tevî jin û zarokên xwe, vegeriya Stembolê, mala xwe. Amojna Sitî zarok û neviyên xwe, dîsan, bi çavan, dîtine. Bedirxanî yek bi yek, ji deverên dûr, vedi- gerin. Derketî û muxalifên Siltan Evdilhemîd ko ketibûn ber xezeba wî, vedigerin. Heyameke nû dest pê kiriye, ba û pêlên nû hawirdor vegirtine. Bîhna serbestî û azadiyê ji Stembolê û deverên

dewleta Osmanî difûre. Sala 1908-an bi coş û heyecaneke boş, bi rûdan û bûyerên tarîxî diqulipe ser sala 1909-an. Belê, li gora »waqa-nûser« û tarîxnasan, rûpeleke nû ya dewleta Osmanî vebûye; Meşrûtiyeta Duwemîn dest pê kiriye. Êdî Siltan Evdilhemîd ne desthilat e. Gerçî ew hê jî siltan û serekê dewletê ye, hê jî li saraya Dolmabahçê, Yıldız Sarayiyê mîna padîşeh, li ser textê zêrîn rûniştiye, lê nema »hakîmê mutleqê« dewletê ye. Êdî sadrazamên wî nîn in, hukümetên wî nîn in, teşkîlata wî ya îstîxbarat û sîxuriyê nîn e, ordiya wî nîn e. Stêrkên ko di esmanên Bo ðazîçiyê de dixurûcin, yên wî nîn in.

Karîna dewletê û çerxa gerandina karên wê ketiye destê komeleyekê ko jê re dibêjin »İttîhat we Terakkî Cemiyeti.« »İttîhat we Terakkî« ko xwe mîna »Nigehbân-i Meşrutiyetê« dibîne û dê di rûpelên bê de gelekî tesîr li rê û xaçeriyên romana bike, piranî ji zabit û sereskeran hatiye pê.

63

Kes, hêz û quwetên ko ji hukimdariya Siltan Evdilhemîd nerazî bûn, gihîştin hev û di rêberiya »İttîhat we Terakkî Cemiyetî« de li dijî Evdilhemîd serî hildan. û niha serhildan bi ser ketiye; Evdilhemîd hemû şertên serekên serhildanê qebûl kirine. Sadrazam guheriye, hukümet guheriye, gelek ji paşa û sereskeran guherîne. Kanûn-i Esasî ko ji sala 1876-an û vir ve bi kar nedihat, qebûl bûye, Qanûna Tatîl-î Eşgal ko pêwendiya karker û karbidestan bi rê dixîne, derketiye. Azadiya çap û çapemeniyê qebûl bûye. Hilbijartina giştî çêdibe, Meclis-î Mebûsan ko daxwaza herî girîng a serhildanê bû, vedibe. Jiyana siyasî ya dewleta Osmanî ji binî ve diguhere. Bi gotina rojnamên Times û İdam-ê, dewlet û Stembol diçelqe. Li her derê civîn, xwepêşan- dan, meş û xeberdan heye. Hemû çîn û komên civata Osmanî li pê ne û li pey mafên xwe ne. Gelên netirk yên Dewleta Osmanî li hêviya mafên xwe yên neteweyî ne. Meydan vebûne, qîrîna serbestî û azadiyê bilind dibe; »Yaşasin hürriyet!.. yaşasin adalet!.. yaşasin eşitlik!..« Navenda van hemû guherîn, bûyer û rûdanên tarîxî jî, bêşik, Galata

û doraliyên Galatayê ye. Li milekî Cade-î Kebîr, Beyo ðlu, taxên ermen, cihû, yewnan, îtalî û balyozxanên dewletên Rojava, li milekî jî Bab-i alî û Ca ðalo ðlu, Galata dîsan bûye şahîdeke bêhempa, dîsan bûye hoste û tarîxeke nû dihûne, bûye zêrker û wextê dineqîşîne, bûye waqa'nûser û her tiştî derbasî defteran dike. Keştî tîn û hinekî ji Galatayê bi dûr lenger davêjin û bi qayikan der- ketiyên azarkêş ên do dişînin Galatayê da ko Galata wan hembêz bike, xêrhatinî li wan bike, birînên wan bicebirîne, wan ji nû ve têxe nav jiyana Stembolê ya tevlihev. Stembol; qedera min, navenda jîna min. Stembol; warê hatin û hebûna min, siya min. Stembol; li welatê xerîbiyê welatê min, welatê xerîbekî li welatê xerîbiyê, ji Kurdistanê dûr Kurdistana min... Em dîsan v egeriyabûn Stembolê, mala xwe. Kekê min Sureya jî, ji Misirê, hatibû. Mal şên dibû, malbat geş dibû. Her roj Bedirxanpaşazadeyekî, bîranîn û tecrubên kirêt û nexweş ên menfayê pê re, dihat. Evçend tecrubên mezin, fireh û kûr. Evçend rengîn û pîrali. Kîjan gotin dikarin têrî taswîrkirina wan bikin? Ax ev gotinên bêkêr, bêkeys û bêruh!.. Tu jî, mîna herkesê ko xwe dispêre gotinan û dixwaze ji wan jîneke nû bîne pê, dixwazî (yan jî em bibêjin, hewl didî) ruh bidî gotinan, can bidî wan rojan... Lê tu dê bi kîjan gotinan

64

bikaribî vegera me û wan rojên şoreşê yên Stembolê vejînî? Em vegeeriyabûn. Mal li hêviya me bû. Metên min, Amojna Sitî ko taqeta wê nîn bû, bi me re bihata menfayê û li nik meta min Melekê dijiya, li hêviya me bû. Kadikoy, Stembol û Galata li hêviya me bû. Heyama nû ya tevîhev, jîna nû ya nenas li hêviya me bû. Lê pêşî me miriyên xwe ziyaret kirin û ew defn kirin. Madame Stella, yan jî bi gotina min Madame Tikanis, kahniya germahiyê, wefat kiribû. Ez, Dayê, şehriban, Kamo û Mezo çûn Goristana Yewnanan û me gora wê ziyaret kir. Alî şamîl Paşa li menfayê wefat kiribû. Bav û mamên min cenaza wî dan anîn û me ew li Goristana Karacaahmet ko gelek Bedirxanpaşazade lê razayîbûn, weşart. Mihemed Begê Wanî ko

Ridwan Paşa kuştibû, li zîndanên Trablûsgarbê di bin îşkencê de wefat kiribû. Cenazê wî hat û me ew li Goristana sküdarê defn kir. Dapîra me hemûyan Rûşen Xanim li şamê wefat kiribû. Ji bo wê, me li bexçê mala xwe şitleke dara henaran çand. Menfa bêşop nebihurîbû. Piştî miriyên me, em çûn Galatayê, pêşiya derketiyên xwe. Ew dihatin, ji Behra Spî, mîna pêlên wê. Rojekê ez, Bav o, kekê min Sureya, Kamo û hin ji mam û metên min, em çûn pêşiya mamê min Husên Paşa. Ew ji Taifê di- hat. Mewlanzade Rifat Beg ko dê di rojên bê de bibûya mamoste, hoste û hevalê min, pê re bû. Ew jî ji Yemenê dihat. Galata dîsan bûbû roja mahşerê, deng digihiyan esmanan. Her celeb însan, her celeb erebe û payton li wir bûn. Bi hezaran kes hatibûn û li hêviya derketiyan bûn. Derketiyên ko di bêdengiya berbangên sibê de çûbûn, niha di mahşera danên êvarê de dihatin. Ew deqa ko mamê min hat, mîna tabloyeke rengîn tu carî ji bîra min neçû. Bavo dest da wî, ew, bi alîkariya Bavo, ji qayikê peya bû. Dest di destan de, bîskekê, bi çavên kentijî û şil, li hev ni- hêrîn û paşê hevûdu pihêt hembez kirin. Hingî wext sekinî... Amojna Sitî ko êdî bi zehmetî digere, heta bi zehmetî xwe dilivîne, ji bo law û neviyên xwe, vê êvarê, nanê tîrê pijandiye û xwarinên welêt, yên Cizîra Botanê, çêkirine. Bîhneke ecêb xweş ji xwarinên singûsîr, pelezîz, eprax û epraxê sîran difûre. Tevî Samîha Xanim û şehrîbanê, Meziyet, Safter, Tefîk û Hîkmet jî li mitbaxê, li dora wê ne. Ew hem li xwarinan dinihêre û hem jî bi zarokan re, bi kurdiya xwe ya paqij, dipeyive. Bask nîn in ko ew pê bifire. Zarok, melayikeyên rastîn li dorê ne, geşiya ruhê wê dîsan hatine.

– Epraxê sîran bidin pîran. Epraxê birincan bidin law û gencan...

65

Amojna we li dora we bigere, berxikên min, rindikên min, ew dibêje û Safter maç dike. Mîna ko straneke nû ya osmanî dibêje; dinya xweş e, wext û dewran xweş e.

66

FOTOGRAF 4: Evîndarê evînê, şagirtê Ovidius;

Celadet

1 Dinya xweş e, wext û dewran xweş e. Ji salan 1909, ji mehan nîsan, ji rojan jî 10 e. Bihar bi kirasê xwe yê kesk, bi rûyê xwe yê gewher hatiye. Galata, Beyo ðlu û Cade-î Kebîr bi şênî û alên Osmanî tijîbûne. Beroşa siyasî ya dewleta Osmanî dûkel e, bûyer li pey hev tîn, guherînên mezin her li dar in. îro jî dîsan guherîneke mezin hatiye pê; Siltan Reşad hatiye ser hukim û li ser textê zêrîn ê padîşahiya dewleta Osmanî rûniştiye. Bi vê guherînê, herkes bawer dike ko rûpeleke nû ved-ibe. û dewlet û Stembol vê rûpela nû pîroz dikin û di kêfa vê rûpela nû de ne. Tevî vê rûpela nû ya dewleta Osmanî, navekî nû û girîng ê romana Bîra Qederê jî, îro, dikeve nav rûpelên romanê; Rûşen, yan jî bi gotineke din Rewşen... Belê, ji xwarziyê Emîn Beg û pismamê Celadet, Mihemed Salih re keçek bûye. Mihemed Salih ko tevî bermaliya xwe li Qeyseriyê dijî, mizgîniya bûyina keçikê, hema di cîh de, bi telgrafê, bi Stembolê gîhandiye. Ew di telgrafa xwe de bi kurtî weha dibêje; »Saadetli Emîn Beyefendi Hazretlerine... Bir kızı n. «smim oldu. Hepimizin gözü aydın merhum ninemizin hatırası na Rusen koyduk...«îro, di vê roja tarîxî de, Celadet, tevî birayê xwe Kamuran û çend hevalên xwe, li ser Cade-î Kebîr, li studyoya »Apollon Fotografhanesi« ne. Berî îro bi du hefteyan, Celadet li vir fotograf daye kişandin û îro jî, di nav vê hatin û çûyina boş de, ew hatiye telefotograf xwe werbigire. Ew, Kamo û hevalên wî, bi hev re, li fotografê, kaxiza nemir, dinihêrin. Fotograf reş û spî ye. Celadet ko niha şanzde salî ye, li kamerayê dini-hêre. Bedlekî kincên reş lê ye. Digel ko ew hê gelekî xort e, nêrîn û rawestina wî, awir û lixwekirina wî ya peyayên gihîştî ye. Ew, li piyan, mîna aktorekî ko hay ji xwe û ji karê xwe heye, hinekî xwar sekiniye. Hemû rûyê wî dixuye, lê ne herdu guh, bi tenê guhekî. Porê wî, pir xweşik, bi paşî de şeh bûye. Ji aliyên herdu cênîkan por kurt jêbûye. Guhê çepê ko

li ser kaxiza nemir dixuye, dirêj e, ji guhekî normal dirêjtir e. Enî mîna asoyeke zelal yan jî heyveroneke spî, vekirî ye. Li ser enî tu xêzên qermeçî yan jî siyên umir û jiyanê nîn in, jiyanê hê enî bi şopên xwe yên kûr neneqîşandiyê. Enî mîna kaxizike spî ko hê tiştêkî lê nebûye, dixuye. Enî jî mîna beden, rû, mil û sîng fireh e. Navçav jî her weha ye, ew mîna gi- ravekê ko di navbera du lehiyan de ye, dixuye. Birûyên wî mîna lehiyan ewçend dirêj, reş û gur in. Birû û di navbera wan de navçav firehiya enî tamam dikin. Herçend firehiyek di navbera por û birûyan de heye, ewçend jî navberiyêke ji normalê zêdetir di navbera birû û çavan de jî heye. Piştî enî tiştê herî balkêş ê li ser rû çav in. çav reş in; mîna du

kah- niyên kûr, mîna du stêrkên çirûsî dixuyin. çav li pêşiyê, l i kamerayê dini- hêrin. Cîddî û giran, kûr û manedar. Germahî û balkêşî, tesîr û nermî ji çavan dixuyin. Meriv xwe ranagire û li çavan dinihêre. Poz jî, mîna çavan, balkêş e. Herwekî hemû pozên Bedirxaniyan, pozê Celadet jî gir û dirêj e. Lê dirêjahiyêke lihevhatî û xweş. Bi gotina dapîra wî Ruşen Xanimê, pozê Celadet mîna pozê beranan e. Tevî ko fotograf ne ewçend mezin e, dîsan jî difnên poz jê baş dixuyin. Difn jî fireh in. Hinarik û gum jî li gora rûyê gulover in; fireh. Dev ko li gora enî, çav, guh û poz, pir biçûktir e, girtî ye. Lêv bi awayekî rehet û serbest li ser hev in. Kortahiyêke biçûk di navbera lêvan û çenê de heye. Ji vê kortiyê jî hîn biçûk, kortiyêke din jî di çenegehê de dixuye. Guloveriya rû bi çenegehê tamam dibe. Belê, rû esmer, gulover û dirêj e. Li ser rû hê ne simbêl ne jî rîh

heye. Rû, rûyê xortekî nûhatî, jiyanêke teze, ruhekî geş e. Ew çend paqij û rind, masûm û hêvîdar, ewçend ji şopên derd û keseran bi dûr. Lê eger meriv pir baş li fotografê binihêre, heye ko meriv di kûrahiya çavan de hin nîşandekên keserê bibîne. Rû nakene, awirekî cîddî li serê ye. Cîddiyeta li ser rû ji xortiya rû pir zêde ye. Herçî stû ye, qut û qaling e. Jixwe gomleg heta ber

devê qirikê hatiye. Stû zêde ne xuyaye. Gomleg spî ye û li gora moda salên 1900-an e. Qirawateke reş pê ve ye. Gomleg û qirawat ahenga kincan tamam dikan. Kincên reş, êlegê reş, gomlegê spî û qirawatê reş. Reş û spî, pir bi zanîn, li hev hatine anîn. Yaxeyên gomleg û çakêt jî li hev in, herdu jî dirêj in. Pêşiya çakêt vekiriye û jê êleg xuyaye. êleg perçeyê »kostymê« e û ew bi şeş kumçikan heta jor girtî ye. aakêtê kriwazor, gomlegê stûdirêj, êlegê pirkumçik, qirawat... ev hemû nîşanî daxwaza mezinbûyin, zilambûyînê ne.

68

Tiştê herî balkêş ê fotografê, tevî rawestina Celadet, destên wî ne. Wî pêşiya çakêt vekiriye, ji herdu aliyan hinekî ber bi paş biriye û destên xwe ji ser re xistine bêrîkên pantolonê xwe. Bi van destên di bêrîkan de, tablo tamam dibe; xortekî ji xwe bawer, emîn, razî, maxrûr, têgihîştî, jîr, bikêr, xurt, lê di eynî wextê de saf, bi heyecan, ziravbihîstiyar.

Ew di fotografê de serbest sekiniye. Serî û stû hinekî xwar, pêşiya çakêt vekirî, dest di bêrîkên pantolon de. Lê ev serbestiya rawestîne ne li gora ciddiyeta rû ye. Rawestin û awir di nav berberiyekê de ne. Heye ko ji ber vê be, mîna ko li pey fotografê kesekî din jî heye ko meriv nikare binase. Mîna ko Celadet, ne bi tenê yek e, ew pir in, ne bi tenê şexsiyetekê ye, ew pirşexsiyet e.

Ev fotografa ko îro, di nav van bûyerên tarîxî de, umrekî xort û dilekî ciwan nîşan dide, meriv dikare bibêje, destpêka tarîxa jiyana gihîştî ya Celadet jî nîşan dide. Ma jixwe fotograf jî ne tarîx e, ne kurtedemeke tarîxê ye? Ma Celadet, ji bo îspatkirin û nîşandana destpêka jiyaneke gi- hîştî, ev fotograf nedaye kişandin? Ne ji bo vê yekê ye ko wî bala xwe dayê ko di vê kurtedema tarîxî de her tiştê wî lihevhatî be?

Celadet, Kamo, hevalên wan li fotografê dinihêrin. Sultan Reşad hatiye ser hukim, Rûşen hatiye dinê. Ji derve deng tên. Celadet, bi ken, li xwe, li fotografa umrê xort, dilê ciwan dinihêre. Celadet, bi ken, li fotografa umrê xort, dilê ciwan dinihêre. Li malê, li mitbaxê,

ew li ser kursiyekî rûniştîye û li fotografa şehrbanê dinihêre. Mîna herkesî şehrban jî li pey nemiriyê ye, ew

2

jî dere ser fotografkêşan û xwe dide ber kamerayan da ko kurtedemeke jiyana xwe bike nemir.

– Pir xweş derketiye, Celadet bi ken dibêje, bi gotina fransizan, te pir xweş »poze« daye.

Li mitbaxê ew bi tenê ne. Li malê jî. Ji bo serdana meta Celadet, Melek Xanimê ko nexweş e, malbat derbasî aliyê din ê Stembolê bûye. Emîn Beg, bi wezîfeyên girîng ên dewletê, çûye derveyî Stembolê. Kamo çûye Moda aayiriyê da ko bi hevalên xwe re gogê bilîze. Li malê bi tenê du dilên ciwan mane. Du dilên ciwan ko bi germî û xurtî hildav ên. Ji rojan yekşem e. Celadet bi hênceta dersan, şehrban bi hênceta paqijiya malê li malê mane.

– Lê te çima ev guliyên xwe, mîna her carê, ber bi jêr bernedane?

69

Celadet bi ken û bi germahî jê dipirse. şehrban ko bi qasî pênc salan ji Celadet mezintir e, lê ji aliyê bejn ji niha ve jê kintir e, ji aliyê paşve, li kêleka wî rawestayê û li wî û fotografê dinihêre.

– Ma ew ne ber bi jêr in? şehrban dibêje û xwe xwarî wênê dike.

Gava ew xwe xwarî Celadet dike, guliyên wê rûyê wî radimûsin.

Bîhneke taybetî, nerm, germ û xweş ji şehrbanê difûre. Celadet hemû

bedena zirav a şehrbanê û bîhna wê, bi kel û germî, hîs dike. Bêyî ko ew hay jê hebe, ew hinekî dilerize û nefeseke kûr dikişîne.

Germahiyeke boş

bi ser wî de tê. Ew hinekî din, bêdeng, li fotografê dinihêre.

– Naxêr, gulî ne li jêr in, te ew li paş veşartine. Bi ya min, gava tu guliyên xwe ber bi jêr berdidî, tu hîn xweşiktir dixuyî. Ew awa hîn bêtir

li te tê.

– Tu rast dibêjî, naxwe haya min jê nebûye...



şehrîban hinekî din nêzîkî li Celadet dike û di serê re li fotografê dini-

hêre. Porê reş ê hinekirî ê şehrîbanê rûyê Celadet mist dide. Ew niha nermahiya memikên wê jî li herdu aliyên milên xwe hîs dike. Hemû bedena wî germ dibe, dilê wî pihêt hildavê, ew pihêt nefes digire û dide. Gotin hew ji devê wî derdikevin. Celadet nizane çi bike. Ew û şehrîban bîstekê wisan dimînin. Paşê, da ko Celadet bala xwe biqulibîne ser tiştêkî din, ew ji pencerê li daran û pelên wan ên rengîn ên payizê dinihêre. Rengên pelan têkel in. Piraniya wan zer dikin, hin mor, hin jî sor in.

Payiz di eynî wextê de payiza umrê pelan e jî. Piştî demeke kurt ew ê biweşin, dar ê rût bimînin, dinya dê kirasê xwe biguherîne.

Payiza umrê pelan û bihara umrê Celadet... Umir û dilê Celadet hê nû hişyar dibe. Bêyî tu gotinan, şehrîban fotografê ji destê wî werdigire û hinekî jê bi dûr dikeve. Nermahiya beden û memikan hinekî jê bi dûr in, lê germahiya bîhna wan hê jî li dora Celadet hilawestiye.

– Min ava serşokê germ kiriye, ew hazir e. Eger tu bixwazî ko ez pişta te kîs bikim, hingî bang bike...

Berî ko şehrîban ji mitbaxê derkeve, jê re weha dibêje û bêdeng dere.

Celadet deng nake, kêliyêkê wisan bêdeng rûdine û li pelan dinihêre. aare nîn e, zagona tabîetê weha ye; piştî demekê pel ê ji jiyane xatir bixwazin, biweşin û winda bin, herin. aare nîn e, ji zayin û mirin, rabûn û ketin, xew û hişyarî, payiz û biharê re çare nîn e. Di vê roja payizê de, bedena Celadet, bi hemû xurtî û xortiya xwe, hişyar dibe.

Celadet, bi hêdîka, radibe, hinekî li dora xwe, li mitbaxê dinihêre û dîsan bi hêdîka, kincên xwe ji xwe dike, wan datîne ser kursiya kêleka

70

xwe û tevî kiras û derpî, ber bi serşokê dere.

aare nîn bû; beden hişyar dibû. Wext, wexta dîtin, nasîn û keşfkirina be- denê bû. Wext, wexta kitekitên ruh û can, hîs û pejnana bû. Wext, wexta cennet û dûjeha evînê, agir û germahiya şehwetê, dînê û dilgermiyahezkerinê û baran û hûnikahiya kêfê bû. Di wan salan de, min xwe û bedena xwe, ji nû ve, lê îcar bi awayekî din,

nasî. Ez divê li xwe mukir werim; şehrîbanê, şehrîbana ko bi beden û zi- manê xwe zimanê bedenê b û, di nasîn, dîtin û keşfkirinê de, gelekî alîkariya min kir. şehrîban stêrka gelawêjê bû, rê nîşanî min dida. şehrîban stêrka kerwankujê b û, dil û bedena min diçirûsand...

Wê rojê ko tu niha qal dikî, di dawiya dawîn de, min deriyê serşokê vekir

û b ang şehrîbanê kir. Ew hat. Min bedena xwe, bi hez, coş û heyecaneke mîna serê çiyayê Agiriyê bilind, pir bilind, teslîmî wê kir. Ew bi hez ûhezkerin, bi qed r û qîmet li min û bedena min xwedî derket. Destên wê yên nerm, tilî û pêçiyên wê yên dirêj, mîna ko ew nexşeyeke nû keşf bikin, li ser bedena min geriyan. Hingî birûskên evînê di ruh û canê min de vedan. Hingî min, bi rastî, bîr bi evîn û evîndariyê bir, min fahm kir ko hez ûhezkerin quwet e, lê di eynî wextê de qelsî ye...

Heta wê rojê jî, ez sunet nebûbûm. Pêşî ew birînên serê min ko ji dayik-

bûnê yadîgarî min bûn, rê li sunetê girtibûn. Pêşî ew birînên ko ji Büyükkadayê yadîgarî min mabûn. Zikê min qelişî bû, sunet nedibû. Lê dotira roja serşokê, ew roja ko zelzeleyeke mezin bi bedena min qewimî, ez çm nex weşxana CeraHPaşşayê û min li wir zêdahiyeyeke din ya bedena xwe ji ser xwe da avêtin.

Min gaveke nû ber bi din ya mêr û mêraniyê avêtibû...

Celadet di nav piştemalan de ji serşokê derdikeve. şehrîban li wir dimîne.

Ez ê herim binîvim. Bila kes bang neke. Bila Kamo jî neyê odê.

Celadet jê re weha dibêje, dere mitbaxê, kincên xwe werdigire û ber bi

oda xwe dere. Ew dixwaze bi tenê bimîne, li zelzela îro bifikire, ji nû ve

wê biqultîne û bijî. Li odê, gava ew dikeve nav nivînan, ew, bi deng, we-

ha difikire; evîn... diyar e, evîn û hezkirin huner e.

3

Bêguman e ko evîn û hezkirin huner e, hunereke zehmet û dijwar, zirav û bihîstiyar e... Welê dixuye ko dilê te yê xort ketiye ber pêlên evîn û hezkirinê... Matta, matta...

71

– Signore, hûn bi halê xortiyê dizanin... Hûn kîjan kitêban tawsiye dikin?

Îro, li aliyê Perayê, nêzîkê Mekteb-î Sultaniyê, li ser Rue de Pera, yanê Cade-î Kebir, di dükana kitêbfiroş a Signore Rionaldi de behs li ser evîn, hez û hezkirinê ye. Signore ko sahafekî yekta yê nas e, ne bi tenê hosteyê kitêban, ew hosteyê ders û şîretan e jî. Hema çi bigire li ser her babetî, bi her şêweyî. Bi alîkarî û rênîşandayîna Evdilrezak Beg ko ji welatê xerîbiyê vegeyriyaye û li pey tevgerên nû û nûjen e, Celadet riya dükana Signore nasiye. Signore merivekî kal, lê hê jî li ser xwe ye. Rîha wî q ît, simbêlênwî boq û badayî ne. Porê wî weşiyayî û ber bi paş şehkirî ye. Ew bejnkin û hinekî piştîxoz e. Signore Rionaldi lewantenekî dewr û dewrandîtî yê Stembol û Perayê ye.

Dükana Signore biçk û teng e, tarî û kevn e. aend mist ronahî, bi zehmetî ji derî û pencera fireh a pêşiyê, xwe bi hundirê dükane digihîne.

Hemû aliyên dükane, heta dêv, bi kitab, kovar û weşanan tijî ye. Serê maseya ko li ber devê derî ye, bi çend qorên kitêban dagirtî ye. Bîhn û hilma taybetî ya rûpelên zer û rizyayî bi ser dükane ketiye. Nêrdewaneke kevn bi çend pêpîlokan, li aliyê hundir

rawestayê. Signore destekî xwe daniye ser pêpîlokekê û bi Celadet re, bi zimanê xwe yê taybetî ko ji îtalî û osmanî hatiye pê, dipeyive. – Bono Begzadeyê min ê biçk, bono... Don û donna... bono, bono... Amore... Evîn, tu dizanî, di umrê însaniyetê de ye. Eger jê ne mezintir be, ciwanxorto... Ez niha ji te re çi bibêjim, ji ko dest pê bikim? Ez behsa kî - jan kitêban, bûyer û serpêhatiyan bikim? Romeo û Julia? Ferhad û şîrîn?

Yan destana we kurdan a navdar Mem û Zîn? Yan jî destpêka me hemûyan, destpêka însan û însaniyetê Adem û Hawa? Ax dîno, evîna dîn... dînîtiya evînê...

Celadet li kêleka masê sekiniye û dikene. Signore pê re dipeyive, yan bi dengekî berz difikire, yan jî bi xwe û tarîxê re dipeyive? Lê her çi be jî, Signore kalekî xweş e, zanîna wî kûr, gotina wî balkêş e. – Signore, min bi tenê dixwest kitabek yan jî dudiyar li ser vî babetî bixwînim...

Bono, xortê dîn, bono... dînîtiya xortiyê... Ma evîn û hezkirin şixulê çend kitaban e? Reçete, reçeteya wê çend rêz in? û ji bîr meke, her reçeteyekê faturayek heye... Li van kitêban, yên li ser refan, li ser dîwar û masan binihêre. Ev hemû li ser reçete û faturayê ne. Di nav rûpelên hemûyan de jin û mêr, mê û nêr, evîn û berberî, cennet û dujeh hene.

72

Heta îro her çi hatiye nivisîn, li ser hal û hewalê evîn û evîndariyê ye, li ser

kirasê germ ê evînê ye, hem d îparêze hem dişewitîne... Fermo dînê biçk, rahêje yekê, rûpelên wê veke, eger te tê de evîn û hezkirinê nedît, hingî ez

ê van kitêban hemûyan belaş bidim te. Fermo rahêje yekê...

– Na, min dil dikir... heye ko tu bikaribî kitabekê bidî min... – Ez... kitêbek... Amores... Mantinuta...

Signore li dora xwe, li jor, li kitaban dinihêre, ji refan kitêbin derdixe, li wan dinihêre, rûpelên wan vedike û wan datîne ser pêpîlokeke

nerdêwanê. Li milekî jî ew, bi lêhûrî, li Celadet dinihêre. Dawiyê ew dere

ber masê çaviyeke masê dikişîne û jê kitabeke biçk derdixe.

– Fermo, vê werbigire. Xwe bispêre rehmeta vê... Tu bi fransizî dizanî,

si?

– Si... Celadet li bergê kitaba biçûk dinihêre. Navê kitêb Ars Amatoria ye,

navê nivîskarê kitabê jî bi tîpên mezin hatiye nivisîn; OVID...

Ovidius... hosteyê hunera evînê, mamostayê min ê yekem û yekta, rêberê riya qed er û jîna min... Signore Rionaldi, lewantenê qedirgir û bîrbir, bi karê xwe dizanîbû. Wî kitabek ko berî wê rojê bi hezaran sal hatibû nivisîn, dabû min. Lê kitabeke nûjen ko tu carî ne kevn, ne jî winda dibû; Ars Amatoria yan jî bi navê wê yê din Ars Amandi, yanê Hunera Evîn û Hezkirinê...

Wê rojê, bi saya pêşniyara Evdilrezaq Beg, min gelek tişt qezenc kirin;

min Signore û dûkana wî nasî. Min bîhna rûpelên tarîxî, dewr û dewranênbihurî nasîn. Li Perayê, min warekî din ê germ û xwendegeheke din a dewlemend nasî. û min Ovidius û eserên wî yê bêhempa nasîn. Pêşî Ars Amatoria, paşê jî Amores, Heroides û Metamorphoses... Min ew nasîn, berî ko qedera min jî bibe mîna qedera Ovidius û ez jî bikevim ber pêlênderketin û sirgûniyê.

Min rûpela yekemîn a kitabê li nik Signore vekir û ew rêzên pêşîn bi deng xwend in; »S-il est quelqu'un de notre pouple a qui l-art d -aimer soit inconnu, qu'il lise ce poème, et, instruit par sa lecture, qu -il aime... Yanê... Hezkirin huner e. Eger di nav we de hê jî kesekî heye ko derneketiye seyrangeha vê hunerê, hingî ew kes divê vê berhemê bixwîne û piştî ko wî ev xwend, tiştên ko jê hîn bûye, biceribîne...« Destpêk, mîna her destpêka berhemeke bedew, xweş û spehî bû. Belê, Signore kitabek yekta dabû

73

BÎR A Q ED ER Ê

min, bersivên dilê min ê xort ko dê dilê min hîn dewlemendtir û geştir biki- rana, tê de hebûn...

– Gracia Signore, pir spas. Ez ê hefta were, dîsan bêm. Di xweşiyê de bimîne.

Celadet kitêb dike bin çengê xwe, ji dûkana biçûk derdikeve û di vî danê êvarê de berê xwe dide ber bi Galatayê da ko li wir, li aliyê din ê

Galatayê, li Helebê, keştiya ko di navbera Kadikoy û Stembolê de sefer

dike, siwar be û here Kiziltoprakê.

4

Celadet kêfxweş e, deriyên nû yên hînbûn û zanîne li ber wî vedibin. Celadet kêfxweş e, deriyên nû yên hînbûn û zanîne li ber wî vedib-

1. Sedsala bîstan, qirn û babilîska nû, bi xurtî dest pê kiriye; her roj, hertim bûyerên nû û girîng, îcadên nûjen û balkêş tîne pê. Fikir û raman, hîs û pejnên nû civatan vedigirin. Dewleta Osmanî û payitextê

wê Stembol bûne mîna hêlekanekê û li ber ba û bahozên guherînan bi vî alî û bi wî alî de derin û tîne. Bûyer û şoreşên Awrûpayê, nemaze yên

Fransa û fransizan, pêl bi pêl, bi ser Stembolê de tîne. Stemb olî, xwenda

û zane, bîrewer û ronakbîr, ramangîr û bîrbir, karger û rêberên dewletê di nav pêlên dîtin, bîr, fikir û hîsiyatên nû de, mîna hêlekanekê, derin û tîne. Herkes hewl dide da ko pêlên nû yên pêşketinê têbigihê.

Sal, 1911 ye, Celadet ketiye hîjdehan. Celadet ketiye nav rûpelên kita-

ban, hem li xwendegehê, hem li mal û kitabxanê. Hertim çend kitabên

bi osmanî, fransî û kurdî di bin çengê wî de yan li ber serê wî ne.

Zanîn

bûye kahniyeke hênik û Celadet, tevî bira û hevalên xwe, jê vedixwe û tîhna xwe dişkîne. Ew peyv û gotinên nivîskî vedijîne, ruh dide wan, bi wan re dipeyive, fikrîn û peyivînê, ev herdu kirinên cihê, bi hev re dikeyek. Hê di vî umrê xort de ko ji tecruban bi dûr e, bi alîkariya bira, ap, met û biraziyan, wî bîr bi hêz û quweta gotina nivîskî biriyê. Wî bîr pê biriyê; tecrubên nû dê bi neqşên gotina nivîskî dewlemendtir, xweştir, kûrtir û zelaltir bibin.

Îro, Celadet û çend hevalên wî, li ser gotina mamostayê wan ê edebiy-

atê, hatine şehzadebaşi-yê, salona tiyatroyeke mezin. Li gora gotina mamostayê wan, îro wê li vê salonê konferanseke »girîng«, ji aliyê du

kesên »girîng«, li ser babetekî »girîng« bihata pê. Celadet ko li pey pêt û

çirûskên zanînê ye, hevalên xwe jî dane pey xwe û hatiye konferansê. Piraniya şênîyên ko hatine, xort û xwendevan in. Hema çî bigire, salon

74

nîvtijî ye. Li ser dîwarên salonê, bi tîpên erebî û ermenî, lê bi zimanê os-

manî, gotinên edebî hatine neqîşandin. Li ser perdeyên şano ko ji cawên sor çbûne, çend wêneyên zer dixuyin. Hema li pêşiya perdan, li ser şano

maseyeke dirêj û sê kursiyên text hatine danîn.

Celadet û hevalên xwe li rêza herî pêşîn a kursiyên rûniştine. Celadet li

milekî bi hevalên xwe re dipeyive, li milekî jî li dora xwe û paş xwe dini- hêre. Piraniya kesên ko hatine, jê re, rûyên nas in. Beşdar di nav xwe de dipeyivin. Lê gava ji paş perdeyên şano merivekî navsale, navzirav û nav-

dar derdikeve û tê ber masê, deng jî hêdî hêdî tên birîn. Kesê ko li ber

masê rawestayê û ji jor li guhd aran dinihêre, yek ji bîrbir û rêberên par- tiya Ittîhad we Terakkî ye; Yusuf Akçora. Ittihad we Terakki ko îro hemû

karên dewletê bi dest xistiye û wan digerîne, digel hebûna malbata Osmanî û Siltan Reşad, siyasetên ko ji bo dewleta osmanî nû ne, dimeşîne.

Yusuf Akçora, bi dengê giran û berz, xêrhatinê li be şdaran dike û go-

tarbêjê konferansa îro bi wan dide nasîn. Gotarbêj ji welatê Kafkasyayê, tirkekî zana Ismail Gansperen ski ye. Piştî ko Yusuf Akçora navê wî dibê-

je, ew jî, ji paş perdê, herdu aliyên perdên girtî vedike û tê ber masê. Herdu hevûdu hembêz dikin û bi hev re rûdinin.

Celadet bi meraq li wan dinihere û di rûpela deftera xwe ya biçk ko di

destan de ye, weha dinivîse; 10 Temmuz-un ikinci sene-i devriyesinden 10 gün evvel... şehzadebaşı...

Belê, gotina te ye, min welê nivisî... Min ne bi tenê bîr bi quweta gotina nivîskî biribû û ew dixwendin, herweha min ew bi pênuşa xwe ya xort û nehoste dianîn p ê jî. Wext mîna hespekî seglavî li bezê ye. Ji gotinên nivîskî pê ve kî bi lez û beza wextê dikare? Ew kîjan heş û bîr, mêjî û zanîn e ko dikare xwe li hember lehiya wextê rabigire?... Lo ma, carina minpênûsa xwe ya bêziman li ser kaxizên spî digerand û bûyer dianîn ziman.

Wê rojê jî welê bû; Yusuf Akçora û Ismaîl Gansperenskî Beg... Bi dû wê

rojê re, bi qasî bîst û du salan, 8'ê kanûna sanî, 1933-an, li şamê, bi alîkariya wan gotinên ko min li şehzadebaşiyê nivîsîb ûn, min ji serekkomarê Tirkiyê, Mistefa Kemal Paşa re name yeke dirêj nivisî. Di nama ko min bi zi- manekî xweş, bi rêz û rêzdarî, nivîsîbû de, min rexne li siyaseta Tirkiyê ya li ser kurd û Kurdistanê girt û ew siyaseta mîna nijadperestî û tirkîti bi nav kir. Di namê de, min mîsala roja



şehzadebaşiyê jî da. Ji lewre, tovên dijminahî û b erberiyê, tirkîtî û nijadperestiyê hê di salên 1910 -an de dihate çandin.

75

BÎR A Q ED ER ê

Wê roja şehzadebaş iyê, Ismaîl Gansperenskî, merivekî ko ji welatên

xerîb hatibû û hê baş bi tirkî nizanîbû, di konferan sa xwe ya dirêj de, her û her behsa tirk û tirkîtiyê kir. Wî, bi tirkiya xwe ya ecêb ko me bi dijwarî jê fahm dikir, her digot »türk we gayri türk«. Gava konferans q ediya, me jê bi tenê tiştê fahm kir; li ser axa dewleta Osmanî bi tenê tirk hene, herkes tirk e û herkes wê tirk be... Bi gotina birayên me yê kurdên so ran, gotinên wî qor bûn. Hema di wê salonê de, kesên ko tirk bûn, bawer bike, bi tiliyêndestekî dihatine hejmartin. Ez û hevalên min, em şeş kes bûn; du kurd, çerkezek, arnawitek, gurciyek û rûmek. Belê, em osmanî bûn, lê ne tirk. Hurmeta me ji bo »Halîfeyê rûyê zemîn« bédawîn bû, em misilman b ûn, lê ne tirk. Em bira bûn, lê ne tirk... Hingî me li xwendegehê rojnameyek di- weşand. Ez gerîndeyê wê bûm. Dotira roja konferansê, min ji bo roj- namê, li ser kurd û Kurdistanê, bendeke çandî û tarîxî nivîsî û di rojnamê de weşand.

Herçî ew qisên qor, digel ko ew qor bûn, bûn sebebê perçebûn û hilweşîna Dewleta Osmanî, bûn sebebê ax û axîn, qîrîn û hawar, kîn û ne- fret, mirin û kuştinê. Welat bû gundekî xirbe, jê dû û dûman bi esmananket. Riyên welêt bi cendekên miriyan tijî bûn, teyr û tûr li serê veni ştin... Min ev hemû, digel her kitekitê, bi hêz û quweta gotina nivîskî, ji Mistefa Kemal Paşa re nivîsîn. Lê heyhat... kesên ko bi fort û hêza şûrê xwe bawerbin û bîr bi quweta gotina nivîskî neb in, guh nadin gotina nivîskî heta ko ew bi x we, bi tecrubên xwe, nebînin ko hêza şûrê xwînrêj ne bi qasî îlim û zanîn, peyv û gotina nivîskî ye...

Bi dû konferansê re, li ber deriyê tiyatroyê, Celadet û hevalên wî li hev dinihêrin. Ji kesî deng dernakeve. Tirk û tirkîtî... »Herkes Türk

olmak mecburiyetinde... Bu ülke Türklerindir» Celadet lal bûye,  
nikare

bipeyive, ker bûye, hew dangan dibihîse, mîna ko yek dilê wî  
diguvişîne. Ew, bêdeng, bîhteng, ji hevalên xwe xatir dixwaze,  
serê wî di ber de, dest

di bêrîkên pantolon de, hêdî hêdî, ji wir bi dûr dikeve. Di mêjiyê wî  
de dengê Ismaîl Gansperenskî, dilê wî, pihêt, hildavê.

5

Dilê Celadet pihêt hildavê. Di êvareke ronî ya havîna 1912-  
an de, Celadet, Kamuran û çar hevalên xwe li aliyê Kadikoyê,  
Fenerbahçe, li bexç Otel Belvu rûniştine û şîva êvarê dixwin û bi  
qaseyên zîvîn meya sor a Belvuyê vedixwin. Wan hemûyan bi  
serfirazî

xwendina xwe xelas kirine û vê yekê pîroz dikin. Bexç Belvu, mîna  
her

76

carî, tijî ye. Aliyê hundir, gazîno û otêl jî. êvar mîna êvareke çîroka  
şehrezadê ya Hezar û şevekê ye; ro nû li aliyê din ê zeryayê çûye  
ava, stêrk hê hilnehatine, refekî teyran li ser Bo

õ azîiyê bi nazdarî d ifire, garson çî-

rayên bexçe ko aheng û renekî taybetî didin der û dorê, yek bi  
yek vêdixe, dengê tenik ê pêlên avê xeberdanên mêvanên bexçe  
temam

dike, ji hundir, aliyê gazînoyê dengê saz û neyê tê, ji der dengê  
simên hes-

pên faytonan tê, bîhna zerya û xwarin û şîvên taybetî yên osmanî bi  
ser

bexçe ketiye... û li masa Celadet û hevalên wî jî, bîhna lewantên  
bedenên

xort û şîvên navdar ên osmanî yekitiyeke lihevhatî tînin pê.

Celadet, Kamuran û hevalên wan li hêviya vê şevê bûn. îşev kêf û

henek divê, xwarin û vexwarin divê, musîk û dans divê. Berî îşev bi du heftan, Celadet li Belvu, ji bo heft kesan cîh veqetandibû û ji menu-yên

Belvu şîv û xwarin hilçandibûn. Lê hevaleyê wan ê rûm ko nasê xwediyê Otel Belvu bû, nex weş ketiye û nikare were. Ew şeş kes li ser xwarinê ne. Garson di destên wan de tebax û teyfik, li dora masa wan derin û tîn. Ew ê vê êvarê heta derengê şevê bix win û vexwin. Pêşî ji wan re zeytinya

đ li

kerevîz dolmasi hat, paşê karîdes güveç. Niha jî ew di nav tebaxên zîvhêlî de şîva êvarê Teşrîfat-i Naim Efendi si

đir külbastisi ka

đitta tevî çiroz sala-

ta dixwin.

Celadet tîkeyên biçûk ên goşt bi hêdîka dibe devê xwe, kêliyeke dirêj di

devê xwe de dicû û paşê dadîqultîne. Tahma şîvê ne ya gotinê ye. Xwediyên Belvu, ji bav û kalan, rûmên Stembolê ne. Wan ahengeke

xweş a osmanî û cîhana rojava dane hemû Belvu. Xwarinên wan bêtir os-

manî ne, musîka ga zînoyê hem osmanî hem a la franga ye. Avahî û mî- mariya otel, gazîno, restoran û bexçe jî her wisan e. Bexçe li peravê Zeryayê, di nav daran de ye û bi lengergeheke biçk xwe digihîne avê. Carina mêvanên bijarte, les gentil hommes ên Belvu bi qayikan tîn

Belvu.

– Guhê xwe bidin vê stranê... we ew nas kir? Ji hundir, aliyê gazînoyê dengê musîka osmanî û dengbêjekî navdar ê osmanî tê. Kamuran ko ji musîk û musîkjeniyê pir hez dike, hema çi bi -

gire hemû stranên osmanî, fransizî û rûmî jiber dizane. Ew guhê xwe dide stranê; yeter ey gozleri sevda dolu esmer güzeli...

– Guhê xwe bidinê, ev çi dengekî nerm mîna qedîfê, ev çi straneke xweş

mîna şîrên Xeyam!..

Bexçe hinekî zirav û dirêj e. Hema li pêşiyê, li aliyê çeperastê masa wan,

maseyeke din a dirêj heye. Li wê masê, meriveki rûdirêj û rîtenik jî dibe

77

BÎR A Q ED ER ê

şîrîkê stranê û bi alîkariya destan, distrê, »ey esmer güzeli...« Dengê mêrik

ne tu den g e. Celadet û hevalên wî dikenin. Mêrikê rîtenik, bi kêf, dest li

wan dike da ko ew jî pê re bibêjin. Li aliyê rastê mêrik jineke rûxweşa navsal rûdine, li aliyê çepê jî keçeke ciwan û çavxweşik.

çavxweşik... Celadet bi dîqet bala xwe didiyê. Gelo ew vê çavşêrînê nas

nake? Ji kû, gelo ji kû, ew van çavan dinase? çavên Celadet hewderekî din dibîne, ew her li ser çavên keçikê ne. Keçik vê yekê dibîne, ew jî li çavên Celadet dinihêre, lê bi dû kêliyekê re, ew çavên xwe jê direvîne.

Awir û nêrîna Celadet bala Kamuran û hevalên din jî dikişîne. Ne bi tenê bala wan, bala masa din jî. Lê Celadet nikare xwe rabigire, çav li kûrahiya

çavên spehî dinihêrin. Merivê rîtenik ji masê radibe û bi stran û kentê

ber masa wan. Bîskekê ew li hev dinihêrin. Bejna wî dirêj, kincên wî spe-

hî, awirên wî nerm e. Ew destê xwe dide Celadet,

– Siz Bedirhanpaşazadelerden olmalýsýný

z?

Celadet bi serî dibêje, belê. Her ê, ew ji Bedirxanpaşazadeyan e. Yê li

aliyê din ê masê rûniştî jî birayê wî ye, yê din jî heval in.

– Buyurmaz mý

sýný

z?

Bi gotinê re, Celadet cîh nîşanî wî dike. Mêrik li kêleka Celadet rûdine

û silav dide yê masê.

– Ben Murat Bey-i taný

yorum. Komşuyuz... Bundan birkaç yıl önce de

Abdulrezak Bey-le tatsý

z bîr olayýmý

z olmuştu...

Bi ser gotinên mêrik re, ji nişka ve, keçik tê bîra Celadet; Galata, li ser

Galatayê. Ew danê êvarê... Ew, Sureya û Evdilrezak Beg... bûyera

nexweş... çav, çavên bademî... Canan, belê, Canan...

– Tamam hatý

rladý

m, ben de oradaydým, Galata-da... Yalnız isminizi

unuttum.

Alî Siud, navê wî Alî Siud e. Alî Siud Beg û ew dikevin nav sohbetê,

qala wê rojê, Kadikoyê, hal û hewalên dost û nasên hev dikan. Lê

çavên

Celadet li ser çavan in. Piştî demekê, Ali Siud Beg ji wan xatir

dixwaze û dere masa xwe. Celadet jî p ê re radibe û wî heta masê

dibe. Li wir Celadet

silav dide yê masê û vedigere ser keçikê,

– Sizi tanýdý

m, Pederinizle birlikteydiniz, Galata-da.

Keçik, bi hêdîka, dikene û serê xwe bi ûsil dihejîne. Celadet bi ken

lê

dinihêre.

– Sizi dansa davet etsem, acaba terbiyesizlik mi etmiş olurum? Keçik, bi hêdîka, dikene, bi ûsil radibe ser piyan, li Celadet dinihêre û

berê xwe dide aliyê hundir, cîhê dansê.

78

Ma Ovidius weha negotibû? »Heke tu bi gotinên min bawer î, heke bayên

zeryan gotinên min nedin ber xwe û nebin, şîretekî din li te: Heke tu bi xwe

ne bawer î û di biryara xwe de ne qehîm î, hingî tu carî dest bi aventurê meke...«

Ez bi xwe bawer, bi biryara xwe qaîm bûm. Wê şevê me dans kir, ez bûm

çira, Canan bû p epûla dora çirê. Canan bû heyv, ez bûm stêrkên dora wê. Me dans kir, demeke dirêj, ji xwe ve çûyî, bi ronahiya kahniya ç avan, bi pê- ta agirê dilan...

Piştî ko Celadet û Canan ji hundir vedigerin, Canan li cîhê xwe rûdine û Celadet jî spasî wê dike, silav dide Alî Siud Beg û yên din û vedigere masa xwe. Derengê şevê ye. Kamuran û hevalên wan şîrinahiya xwe jî xwarine. Ya Celadet, şîrinahiyeke kevn a osmanî fistikli hünkar muhallebîsî, kurukayisiezmesiyle, di nav teyfikeke neqîşkirî de, li hêviya wî ye. Celadet dest

6

bi şîrinahiyê dike, lê li milekî jî li çavên Cananê dinihêre.

Celadet li çavên Cananê dinihêre. Xwedayo... du lib lûlû, du stêrk, du kahnî, du lehî, Dijle û Firat... Canan bi ken rûyê xwe jê badide.

Celadet rûyê wê ber bi xwe dike û dîsan li çavan dinihêre, bi çavan dipeyive, bi çavên wê r e dipeyive. Di çavên wê de jiyaneke ciwan, straneke bedew, evîneke yekta, hîseke germ dixuye. çavên wê jiyane.

Jiyan li ser çavên wê dikene.

Canan, hinekî bi şermokî, dikene, devê xwe vedike ko tişteki bibêje.

Lê

Celadet bi destê xwe devê wê digire, bi çavan jê re dibêje ko îro bi tenê çav

wê bipeyivin. Bi tenê çav û beden. Ne tiştêkî din... Celadet herdu çavên wê radimûse û bi destê xwe yê rastê qirik, sîng û ber û bedena wê mist

dide. Beden mîna hewreşîmê tenik û nerm e. Dest hêdî hêdî li ser bede-

na wê digere.

Beden westiyayî ye, beden westiyayî ne. Di nav cîhan de, li ser çarşefên

peregende, bedenên tazî û xwîdandayî li kêleka hev dirêj bûne û bi bîh- na hev bîhna xwe vedidin. Celadet û Canan li aliyê Bab-i aliyê, nêzîkê Cagalo

đluyê, navenda rojname, kovar û weşanên hemû Dewleta

Osmanî, li odeyeke fireh a pansiyonekê ne. Pansiyon, ya bavê hevlekî Celadet e. Hevalê Celadet bi xwe jî, di rojên tatîlan û dawiya heftan, ji

pêncşemiyê heta şemiyê, li pansiyonê nê dixebite. Celadet û hevalê xwe li hev hatine, gava hevalê wî dixebite, ew û Canan tîna pansiyonê, kilîta oda

ko ji bo wan hatiye veqetandin, werdigirin û derin odê. Ji wan kurte-79

BÎR A Q E D E R Ê

demên pir pêwîst pê ve, ew ji odê dernakevin.

Mîna îro...

Pansiyon sê qat e. Di her qatê de sê ode hene. Celadet û Cananê odeyek

li qata herî jêrîn, lê li aliyê paş, hîlbijartine. Ji ber ko oda wan li kêleka

bexç aliyê dawîn e. Bi hêsanî û bê êyî ko ew kesekî bibînin yan jî kesekî

wan bibîne, ew dikarin derkevin bexçê biçk.

Oda wan îro jî, mîna her car, tevlihev e; ode, odeya evînê û hezkirinê  
ye, her kursiyek li derekê, li ser kursiyên cil û bergên Celadet û Cananê,  
bahlîf û lehîf li erdê, li ser masê jî xwarin û vexwarin û şûşeyên mey  
û araqê. Ew jî li ser textê razanê, di nav cîhan de, peregende, dirêj  
bûne. Destê Celadet sîng, pêşîr û berê Cananê, bi nermahî, mist  
dide. çavên  
Cananê vekirî li Celadet dinihêrin, lê heşê wê li derekî din e. Bi hez  
û coşa hezkirinê, ew ketiye nav xewn û xeyalên şêrîn. Bîhnek mîna  
bîhna barana  
biharê, mîna bîhna sêv, xox û biyokên teze ji bedena Cananê  
difûre. Bîhneke mîna pûngê hinekî tirşokî, lê xweş û ne giran.  
Bîhnek ko  
Celadet jê hez dike. Yanê bîhna piştî zelzela hezkirinê. Tiliyên qaling  
ên  
Celadet li ser memik, sermemik û navmemikên Cananê, bi ûsil,  
derin û  
tên. Bi tevgera tiliyan, sermemik jî hêdî hêdî radikêşin. Canan bi  
axîneke  
tenik çavên xwe digire û xwe hinekî ji Celadet bi dûr dixîne. Celadet  
li hemû bedenê, bedena ciwan û lihevhatî, li sîng û ber, memik,  
navteng,  
zik, berzik, mûyên pir hûr û kêm ên berzikê, hêt û çpan dinihêre. Tu  
kê-  
maniyên bedenê nîn in, her alî li yê din hatiye. Her alî bi serê xwe  
bi-  
huşteke ye.  
Celadet nêzîkê Cananê dibe û stû û qiriqa wê maç dike. Canan jî  
destê  
xwe davêje ser serê wî û porê wî mist dide. Rawest navê. Bîhna  
bedenan hevûdu dikişînin. Beyî ko Celadet lêvên xwe yê şil û germ



bigire yan jî ji qirikê vekişîne, ew hêdî hêdî ber bi jêr, binçengê dibe.  
Binçeng şil e, jê  
bîhna xwîdanê tê. Celadet kêlîyekê binçeng bîhn dike û radimûse.  
Bi dû  
re, lêv vedigerin ser navmemik û memikan. Celadet bi herdu destên  
xwe memikan nêzîkê hev dike û lêvên xwe li ser herdu sermemikên  
qahweyî  
û mezin bi hev re digerîne. Sîng û bedena Cananê, tevî axîneke  
nerm, bi xurtî, radibe. Hêt û şeq vedibin. Canan bi herdu destan  
serê Celadet ber bi jêr dike. Lêv hêdî hêdî ber ji jêr dibin...

Min navê ko ez li ser evîn û evîndariyê, hez û hezkirinê bipeyivim.  
Mîna her tiştê nazik û narîn, ev jî d i karin li ber tava gotinên zêde  
biçilmisin. Meriv di- vê jê haydar be... Cananê deriyên dil û canê  
xwe, ruh û bedena xwe ji bo

80

min vekiribûn. Heşê min ji serê min çbû. Evînê li min û mêjiyê min  
guh - darî nedikir. Dilê min bûbû hespekî rewan û di deşta evînê de  
serî girtibû

û diçû. Ez bûbûm evîndarê keçikeke... belê, keçikeke çawan? û kî?  
Eger ez bibêjim ko ew keçikeke tirk bû, na ne welê bû, kurd bû, na.  
Ne tirk bû, ev jî

1. Bavê wê Alî Siud misilmanekî arnawidên Kosowayê bû. Diya  
wê boş- nakeke Bosna Hersekê bû ko li Stembolê hatibû dinê.  
Bavê Cananê li şeremîniya Stembolê memurekî mezin bû. Ew  
merive kî ehlikêf, medenî, ji siyasetê dûr, merivê her dem û  
heyamê bû. Diya wê jî jinekek di halê xwede, hebûn û nebûna  
wê nediyar, bêdeng bû. Cananê li Modayê, li sul- taniyeke  
fransizî dixwend. Xwendegeh leylî bû, Canan dikaribû bi şev jî  
li wir bima. Lê li dewsa xwendegehê, gelek şevan ew li wê oda  
me ya fireh, bi stranên fransizî, serê wê, li ser sînga min,  
radiza.

Ez, neviyê Mîr Bedirxan, lawê welatê Kurdistanê, bûbûm evîndarê

Cananê, keçîkek ji war û d iyarên xerîb, ji aliyê din ê tixûba Osmanî, Ewrûpayê. Ez pê re digihîştim kata herî bilind a mesûdî, serfirazî, kêfxweşî û hezkirinê. Bedena min pê re digihîşt kata herî kûr a coş û heyecanê. Lê haya min hê ji bayê felekê û lîstikên dewr û dema kambax nîn bû...

Lê, heçî ode û bexçe bû, te dîsan tiştêkî ji bîr kir; bîra li bexçê. Ew bîr

muhîm bû. Gava bîhna bed en û xwîdanê bi ser me û odê de diket, ez derdiketim bexç, min ji bîrê çend satil av dikişand û me bedenên xwe pê hemamişk dikir. Bîrê û çêyiyên bîrê ji bîr meke...

Herdu beden dibin bedenek, ew di nav bêdengiyeke germ de, dîsan, dikevin nav hevûdu. Celadet, ji jor ve, bi çavan, pê re dipeyive; le tempe d-amure, de la fatalîté... toujours, toujours...

Canan, ji binî ve, bi reh û

demarên rakişiyayî yên gewriyê, serê xwe hinekî radike û bi çavan bersîv

didiyê; oui, oui... Belê, belê...

81

BÎR A Q ED ER Ê

82

FOTOGRAF 5: şerê cîhanê; heyama mirin û kuştinê, şewat û rehmetê

1

Belê, belê... mirin e, ba û bahozên mirinê ne, dû û dûmana mirinê

1. Fotografê pêncemîn a romana ya mirinê ye. Di nav fotografên romanê de, ya herî zêde li mirinê tê, ev fotograf e.

Fotograf jiyanê dikuje, jê kêliyêkê digire û wê demê sabît dike, dike ne- mir. Jiyanê jîndar, wê kêliyê dimire da ko bibe nemir. Di fotografê de

mirin û nemirin di nav hev de ne, mîna cêwîyan, bi hev re ne.

Mîna vê fotografê.

Fotograf reş û spî ye. Reş û spî û kitekitên van herdu rengên bira û ne-

yar. Fotograf ko bergehêk e, bi riyekê dest pê dike. Ne rê, lê ji rê zêdetir ew şiveriyek e. Şiveriyek fireh, bi fetlok û dirêj. Meriv dikare bibêje ko ew navenda wênê ye. Rê, rîya mirinê ye; ew di navenda wênê re derbas dibe

û wênê dike du bir. Birê aliyê rastê û yê çepê. Di aliyê rastê de du gund

dixuyin. Yek li pêşî, yek jî li pey wî. Gundê pêşiyê mezin e û xanî tê de pir in. Yê paşîn biçk e, bi tenê çend xanî ne. Li aliyê din ê şiverê bi tenê zevî ne. Lê di dawîya zewîyan de, li berpala çîyan kon dixuyin. Belê, di dawîya wênê de zencîreçiyayên asê dixuyin. Tiştên ko bergeha fotografê tînin pê,

kêm-zêde, ev in. Yanê tiştên ko meriv dikare di hemû fotografan de bibîne. Bergehêk ko zêde tiştêkî îfade nake.

Lê belê, tiştên din ko bergeha fotografê temam dikin, mana wê jî did-

inê. Li pêşiyê, li ber devê rê, li herdu aliyên cendekên merivan dixuyin. Li gundê nêzîk bi tenê du seg û çar ga yan jî çêlek dixuyin. Meriv nîn in. Li

gundê aliyê jor ê li ber quntara çîyan, bi tenê dûman heye, dû û dûmaneke zirav ber bi esmanan dibe. Li aliyê din ê şiverê, li ber konên reş,

bi qasî heft, heyşt hesp - heye ko ew qantir in - dixuyin. Ji konan hinekî bi dûr û hinekî nêzîkê rê, çar topên eskerî, lûleyên wan ber bi gundan,

dixuyin. Li pey van hemû tiştan jî çîya hene, serê wan di nav ewran de, bi

hev ve girêdayî, bêyî rê û bihur. aîya rût û tazî ne, ne devî û dahlek, ne dar û berek, ne giya û hêşînahiyek û ne jî av û kahniyek. Ewrên li ser çîyan jî, bergeha çîyê temam dikin.

83

Fotograf weha ye. Sar, bi xof, kesertijî. û bêdeng. Ji cendekên devê rê pê ve, tê de tu însanên zindî naxuyin. Nîşana merivan tê de hene. Lê ew bi xwe tune ne. Meriv dikare bibêje, siya wan tê de heye. Tevî

siya wan, xof û sawa wan jî tê de heye. Ne bi tenê sî û sawa wan, herweha sî û sawa ruhîstîn jî di vê wênê de heye. War, warê şer e. Dem, dema şer e. Merivên ko di wênê de naxuyin, heye ko mîna cendekên kêlekên rê, ku ştî ne, heye ko reviyane û xwe spartine çiyar, heye ko êrîş birine ser ciyekî din, heye ko ji şer û pevçnê westiyayî, di nav xeweke neşêrîn de ne, heye ko ew li şînê rûniştine, -eger wexta wan ji bo şînê hebe. Her çi be jî, merivên nediyar ên vê wêne, war û demê, di hembêza ruhîstîn de ne. Ew dîlên mirin û kuştinê ne. Cendekên bêkes, heywanên tiral, gundên bêxwedî, şewata gund, topên lûlemezî rewşê baş nîşan didin; şeneyê ruhîstîn li vî cîh û warê fotografê li kar e.

Ne diyar e ka kê ev fotografa ko dibe fotografa pêncemîn a romana Bîra Qederê kişandiyê. Lê hostetiya wî jê baş diyar e. Wî, her mîna siya merivên zînde yê wênê, tiştên nediyar jî reşandine ser wênê. Di fo- tografê de tu nîşanên ba û bahozê nîn in, lê meriv ba û seqemên bayekî hişk jê hîs dike. Sar û seqemên bayê mirinê... Tevî sar û sermê, meriv haletên însanî yê mîna xof û tirsê jî hîs dike. Bêdengiyê jî, meriv welê bawer e, kirasê xwe yê sar rakêşandiyê ser b ergehê. Meriv bawer nake ko hespên wênê dihîrin, seg diewitin, teyr û tûrên nediyar dixwînin.

Fotograf ya bêdengiyê ye, ya keserê ye, ya hilweşînê ye, ya windabûnê ye. Jiyanek di warê fotografê de heye, hebûna heywanan û şewata gund nîşan dide ko jiyaneke nexweş li wir hatiye jiyîn û jiyaneke nexweş ê dîsan were jiyîn. Fotografkêş hoste ye, wî hemû wextên jiyane, do, îro û sibê xistine nav bergeha xwe.

Fotografa ko mirinê dike nemir, dike siya romana Bîra Qederê, berge-  
heke pir biçk a şerekî pir mezin e. Ew nîşaneke biçûk a îspata yekitiya

2

mirin û nemiriyê ye. Ew nîşan dide ko mirin li dar e, li rê ye.

Mirin li dar e, li rê ye, Canan. Mirin li dora me ye, em ber bi mir-

inê derin, Canan, Canan...

Celadet û Canan, bi gavên pihêt, dilezînin. Ew ji Bab–i Alî Caddesi ber

bi jêr dibin. Du rojên hilavêtina dil û yekitiya bedenên li pey mane.

Ew

li cîhana ko wan ji bo du rojan li pey xwe berdabûn, vedigerin.

Canan wê

84

here sultaniyê, nik ezîzeyên xwe yên fransiz. Celadet jî wê here malê,

Kiziltoprakê, nik germahiya nas a malbatê. Sal destpêka 1913'ê, danê

êvarekê yê zivistanê ye. Ew divê bigihên ser Basrayê, keştiya ko dê here

Kadikoyê. Celadet bi gavên fireh dimeşe, Canan jî dilezîne ko xwe bi Celadet bigihîne.

– Canan, ev kevirên ko em pê lê dikin, bi xwîn in, Celadet dibêje.

Hemû der û dorên Bab–i Aliyê, Cada Bab–i Aliyê bi xwîn e.

Canan dengê xwe nake, bêdeng, li pêşiya xwe dinihêre û dilezîne.

Dinya sar e, bayekî sar û hişk tê. Baran nîn e, lê erd ewçend celb e ko

meriv pir bi zehmetî dimeşe. Li doralî, ji esker û zabitan pê ve, kes nax-

uye. Esker di nav paltoyên xwe yên dirêj, li ber derî û caxên avahiyên Bab–i Aliyê di nobetê de ne. Ca

đalo

đlu û Bab–i Alî ko dilê siyaset û

weşanên dewleta osmanî ne, mîna eskerên nobedar, îro stûxwar in...

Ne bi tenê wê rojê, ji demekê ve bû ko ew stûxwar bûn. Dewleta Osmanî westiyayî û nexweş bû. Ewrên reş esmanên Osmanî vegirtibûn. Dewleta Osmanî bûb û mîna wazoya şikestî, ew carekê, bi qetl û kuştinan, şikiyabû, êd î hew dicebirî. Ittîhad we Terakkî

Partîsî li ser hukim bû. Hukimdarê dewletê Siltan Mihemed Reşad li ber destê wan mîna leyistokekê bû, wan her tiştê xwe bi Siltan didan qebûl kirin û pê dilîstin. Piraniya »Ittîhatçiyên« zabit bûn, di şer û lecan de mabûn, destê wan bi xwîn, mêjiyê wan mucrîm bû. Ew hem xeyalperest hem nîjadperest bûn. Tirk, tirkî, tirkîtî ala wan, ve- girtina hemû Asyayê, welatê bav û kalên tirkan armanca wan, qirkirina gelên din ên osmanî mirazê wan bû. Şûr zar û zimanê wan, demançe edet û sila wan bû. Her çiqas kesên li derveyî wan, dijî wan, dûrî wan hebûn, ew neyarên wan bûn. Herkes diviya tirk bûya, ne bi tenê tirk, »tirkç« jî bûya. Islamiyet, osmanîtî, biratiya gelên osmanî... ev hemû wînda bûbûn. Siyaseteke zordar, darê zorê, tîfing û demançn kuştinê li dar bûn... Tovên kîn û nefretê, mirin û kuştinê dihatin çandin.

Ez bawer nakim ko te dil hebe ko tu rûpelên romanê bi kuştin û mêrku-

jiyên wan tijî bikî û romanê biqulip îni ser bûyerên tarîxî. Lê behsa çendine ji wan pêwîst e. Di behsa sûretê 3-an de, te jî, min jî qala Pira Galatayê kir. Galata ko di umrê min de bûbû neqşeke esasî û di muhacirîya min a dirêj de bûbû siya xeyalên min, di eynî wextê de, bû warê yekemîn ê kuştinan. Li ser textên rîziyayî yên Pira Galatayê, di tarîxa 6 Nîsan 1909 -an de (ez dizanim, tu ji bikaranîna tarîxên weha hez nakî, lê ev jî pêwîst in), Hasan Fehmî, sernivîskarê rojname Serbestî, bi destê Ittîhatçiyên hate kuştin.

85

BÎR A Q E D E R Ê

Zabitekî ittîhatç ji aliyê paşve hat û çend gule bera sîng û serê wî dan, hevlekî wî jî birîndar kir. Rojname Serbestî ko bi destê dostê bavê min ( û paşê jî dostê min) Mewlanzade Rifat derdiket, gelekî li dijî hukmê itti- hatçiyên bû. Rojname ko ez jî paşê tê de xebitîm, li ser xeteke medenî û bi gotina ewrûpayîyan lîberal bû. Lê ittîhatçiyên bê xwe kes nedixwestin û

loma jî Hasan Fehmî di nav xwînê de gevizandin... Lê ew guleyên ko li sîng û serê wî ketin, di esasê xwe de, li sîng û serê dewleta Osmanî ketin. Bi wê

cîneyetê, mîna Hasan Fehmî, dewlet jî li ser cogan ket. û wê cîneyetê rê li cîneyetên din vekirin.

Cinayeta herî mezin jî, di wan rojên ko tu niha behs dikî de hate pê. Hema çend hefte berî wan rojan, serekên ittîhatçiyên avêtin ser Bab-i Alî, yanê dilê gerandina karên dewletê Saadaretê. 23'ê çiriyê yê wê salê, it- tîhatç, çek di destên wan de, ketin hundir û li ber salona civînên hukimetê, saet 2 û 45'ê piştî nîvro, Nazirê Herbiyê Nazim Paşa, dîsan bi de- manç, kuştin. Tevî wî, wan du kargirên din ên mezin ên dewletê jî kuştin û careke din dewlet, bi zora çekan, xistin destê xwe.

Ew roja ko tu niha behs dikî, em ji ber Bab-i Aliyê, Saadaretê derbas dibûn. Mîna her gavê, wê rojê jî, li ser wan kevirên ko di bin lingên me de dilîstin, gava em ji berê derbas bûn, kuştin bi bîra min ketin. Hukim ketibû destê xedaran. Her roj hin kuştin çidibûn. Dewlet pir bi lez, ji leza me ya wê rojê pihêtir, ber bi deverên tarî gêr dibû.

Celadet dilezîne, destên wî di berikên paltoyê wî de, serê wî li ber, hem li

keviran dinihêre hem jî dipeyive û ber bi jêr dibe.

– Ah, Ceco, biraz yavaş yürüyemez misin?

Canan dikeve erdê. Celadet lê vedigere, tê ser wê û ji erdê radike, bi

ken, wê hembêz dike. Demeke kurt ew welê di hembêza hev de dimînin

û li hev dinihêrin. Celadet wê hinekî din ber bi xwe dikişîne û diguvişîne.

– Mon amour, eger tu dixwazî, em vegerin pansiyonê? Celadet, bi henekî, jê dipirse.

Canan serê xwe dihejîne û aliyê din ê rê, aliyê keştiyê nîşan dide. Lê ew

nagihên Basrayê. Gava ko ew xwe bi lengergehê digihînin, Basra jî hêdî hêdî avê diqelişîne û dere. Celadet bi hîdet destê xwe li ba dike û dide

çran. Lê keştî dere, mîna nazdareke spehî x we li ba dike û di nav pêlên

avê de ji wan bi dûr dikeve. Pêl wê dibin...

Tiştêkî ko Celadet û Canan bikin, nîn e. Ew jî ji Basra rû badidin û hêdî hêdî berê xwe didin Galatayê, restorana Cenyo da ko li wir tiştêkî

86

3

vexwin, -heta ko keştiyeke nû bê.

Celadet, Canan û herdu birayên Celadet, Kamuran û Tewfîk berê xwe didin Galatayê, restorana Cenyo da ko li wir tiştêkî vexwin, - heta ko keştiya saet pêncê danê êvarê tê. Cenyo mîna îstasyona

keştiyan e, kesên ko li hêviya hatina keştiyan in, tîr vir, çendek rûdinin,

tiştêkî dixwin û vedixwin û paşê derin. Kesên ko tîr, bêtir rojnamevan û nivîskar in. Haya wan baş ji guherîn û pêşketinên cîhanê, rewşa dewletê

û lîstikên siyasî yê li pey deriyên heye. Piraniya wan di rojname û ko-

ş alo

ş luyê de dixebitin û alîgirên hêz û komên siyasî ne. Ji ber vê

varên Ca

yekê ye ko navê Cenyo bûye »beroşa gotin û paşgotinê.« Nûyên herî dawîn ên her tiştî, pêşî ji Cenyo tê bihîstin û paşê belav dibe.

Di van rojên dawiya tebaxa 1914-an de, nûe û xeberên pir giran û girîng, bi leza birûskê, li pey hev tîr. Şerekî pir mezin ê cîhanê dest pê



kiriye, dewletên herî mezin û desthelatdar ên cîhanê ketine hev. Fransîz, inglîz û îtalî li aliyekî ne, aleman, nemseyî û rûs jî li aliyekî ne. Herdu alî

jî bi xurtî derin ser hev û bi xurtî hewl didin ko eniya xwe, bi dewletên

dost û alîgir, fireh bikin. Ji bo herdu aliyên jî hebûn û piştgiriya Dewleta

Osmanî pir girîng e û herdu alî jî li pey dostiya Dewleta Osmanî ne. Lê

belê, Dewleta Osmanî ko di destpêkê de ne xwediyê siyaseteke diyar bû, niha siyasetê xwe diyar kiriye; ew piştgirî li eniya alemanan dike. Dewletê bi alemanan re peymaneke dostiyê îmze kiriye, generalkî alemanî kiriye serokê hêzên eskerî yê dewletê, seferberî îlan kiriye, hemû peymanênkevn ên bi dewletên din ên ewrûpî re, bi serê xwe, fesh kiriye û niha jî di nav haziriyên nû de ye.

Nûeya herî dawîn a Cenyo ev e; ittîhatçî ko dewlet bi dest xistine û karên dewletê dimeşînin, haziriya êrîşekî mezin dikin. Ew ê, bi îhti- maleke mezin, bavêjin ser Rûsyayê. û ew ê herçi kesên ko dikarin çek

hildin, bikin esker.

Di nav van xeber û haziriyên de Celadet û Canan jî haziriyekê dikin; ew ê di demeke nêzîk de destgirtî bin. Ew ê di Cenyo de hem hinekî rûnin û hem jî biryara xwe ya nû ji Kamuran û Tewfîk re bibêjin. Canan, bi bejna xwe ya dirêj, bi porê xwe yê dirêj, bi çavên xwe yê hunguvîn,

îro, di nav fîstaneke binevî de, bûye mîna jineke xewnan. çavên wê yê kilkirî, mîna esmanê îro, dibiriqin. Rûyê wê yê xweş û sade dikene, mîna

vê roja germ, germ e, dilê doralî germ dike.

Gava ew li kêleka maseyeke dirêj rûdin, Kamuran dest li garsonê li

BÎR A Q ED ER ê

ber derî dike û bi ken ji yên dora xwe re dibêje,

– Em ê vê xebera pîroz, bi qedeheke meya spî ya cemidî, pîroz bikin.

Pênûsa te riya xwe vedike, tu bi qîma xwe yî. Min navê ders û şîretan li te bikim. Lê tu jî dizanî, riya qedere ne raste -rast e, fetloke ye, tê de gelek xaçerê hene û ew hemû qeder in, qederê tînin pê. Ez dinihêrim, bala tegelekî li ser şexs û serpêhatiyên şexsî ye. Tu hin tişt, bûyer û pêwendiyên doralî ko li ser riya qedere ne, ji bîr dikî, yan jî nikarî li hûnandina romana

xwe bînî. Em bibêjin, rewşa kurdan a wan salan, nemaze rewşa wan a li ba-

jarê me Ste mbolê... Bi aliyekî ve, qedera min bi vê jî girêdayî bû, ev jî hîmekî esasî yê qedera min bû.

Di nav wan teşqele û geremolên xurt ên siyasî û civa kî de, kurdan jî xwe

dilivandin. Destpêka salên 1910 -an, ji bo kurdan jî girîng bû. Sala 1912-an, wan yekîtiyek bi navê Hêvî ava kirin. Amanca Hêvî-yê reşandina hêviyê bû. Kurd hewcedarê hêviyê bûn. Kurdan, bi taybetî jî xortên kurdan, xwe li dora vê yekitiyê girtin. Mam û pismam, ap û biraziyên min jî tê de, bi xurtî, xebitîn. Wan bi navê Rojî Kurd, bi gotina wê rojê, muceleyek derx- istin. Pismamê min Mihemed Salih Bedirxan sernivîskarê wê bû. Ew bavê Rewşenê bû. Belê, Rewşena ko dê paşê di rojên min ên teng û tarî yên jîna min a muhacir de, bibûya hevala jîna min û diya zarokên min. Min Rewşen jî, cara yekemîn, di wan rojên Rojî Kurd de dît. Salih Beg, ji bo kovare, bi navê »Hişyar bîn « bendek, bi kurdî, nivisîbû û dixwest wê nîşanî me bida. Ez jî li nik mamên xwe bûm. Ew li mala mamê min Mirad Beg bû. Rewşen û diya wê jî pê re bûn. Bi gotina Amojna Sitî, Rewşen hingî pariyekî zarokbû. Umrê wê ne li ser 4-5 salan bû. Ji wê rojê, porê wê yê gurmişkî û fîstanê wê yê rengîn di heşê min de man.

Heçî kurd bûn, benda Salih Beg rewşa wan baş nîşan dida. Benda Salih

Beg weha dest pê dikir; »Ji birayên me kurdan re hişyarbîn divê. Heke ji paş niho jî em çavê xwe venekin û ji wê xewa giran hişyar nebin, ji me re kur- daniya me nahêlin û ê me ji nav holê bavêjin.« Ev rêzên Salih Beg ko min jî paşê car bi car, ji nû ve, bi gelek hêncetan, nivîsîn, hewcedariyên herî bingehîn ên kurdan bûn. Kurdan yekitî, zanîn, hişyarî û hêzbûn diviya. Kurdên Stembolê bi vî karî rabûbûn. Malbata me bi xurtî di nav vî karî de bû, ez jî ketibû m nav refên wan...

Min dirêj kir. Min jî ceribandîye, ez dizanim, meriv çî jî bike, di neqîşandin û avakirina xewn û xeyalên romanêkê de, nikare xwe bi her tiştî, bi her kitekitê, bigihîne. Lê gotina min ev e; d i wan rojên tevîhev û bi

88

lez de, li ser rîya qedera min, li milekî evîn, hezkirin, coş, kêf, haziriyên dest- girtiyê hebûn, li milekî jî amanc û hedefên mezin hebûn.

– Careke din, ji bo xebera pîroz, ji bo serfiraziya Canan û kekê me Celadet.

Canan, Celadet û herdu birayên wî dilopên dawîn ên piyanên xwe vedixwin û radibin pê da ko herin. Êdî wexta çûyinê ye.

4

Êdî wexta çûyinê ye. Wext, wexta barkirin û çyina şerê giran e. Celadet û hevalên wî yên din ên zabit radibin ser piyan û ber bi kolan belav dibin da ko xebera çûyinê bi eskeran bigihînin û li ser wan bin, wan îdare bikin. Ro hêdî hêdî li pey zincîrê çiyayên Torosê hil

tê. Dinya çiksayî, hinekî hûnik e. Dinya hê nû hişyar dibe, hê nû çile û

zivistaneke xedar li pey xwe dihêle û ber bi germahiyê bi rê dikeve. Îro li

vir, her tişt mîna xewnekê, mîna kitekitên efsaneyekê, yan jî yên ro- maneke nûjen, dixuyin...

Celadet di nav qapûtê xwe yê eskerî de, bi aramiya destê sibê, li dora

xwe dinihêre. aiyayên giregir û bi heybet, zozanên hêşîn û hûnik, es- mana paqij û gewher, tîrêjên rengîn ên royê, refên teyr û qulingan,

keriyên pezê gundiyan, dengê seg, rûvî û wawîkan, hîrehîra mehîn û hes- pan, dengê stranên zîz ê eskeran, bergehên yekta yên Torosê... ev hemû, perçeyên roja nû, mîna mehfûreke rengîn û tarîxî, li ber Celadet dixuyin.

Na, ne welê ye. Ew ne mehfûrên tarîxî b ûn, ne jî kitekitên efsane û ro- manekê. Ew rastiya wê ro jê, perçeyên rastî yên jîna min, yên romana Bîra Qederê b ûn. Em li ser riya dûjehê, yanê li ser riya mirinê bûn. Dewleta Osmanî ketibû ser riya mirinê û em ber bi mirinê diçn...

Dewleta Osmanî, bi dek û dolabên aleman û ittîhatçiyên, êdî pir vekirî

bûbû hevalbendê alemanan û ketibû nav şerê mezin. Stola Osmanî, bi alîkariya alemanan, di behra reş de girtibû ser wapûr, noqar û keştiyên Rûsyayê û ew dabûn ber topan. Paşê jî stolê avêtibû ser bajarê Odesayê. êdî tîr ji kevanê firyabû... Siltan Mihemed Reşad, ew hukimdarê bêdeng û nazik, bi zora ittîhatçiyên, »Cîhad -î Muqed es« îlan kiribû. Cîhada ko li gora wacibên îslamê diviya ji bo »Ilay-î Kelîmetulah« îlan bibûya, niha ji bo pişt- giriya alemanan îlan bûbû. Dewleta Osmanî û ordiyên wê êd î ketibû nav gulokên agir ên dûjehê. êdî li ser hemû tixûbên wê şer hebû. êdî hemû

89

BÎR A Q E D E R Ê

kesên osmanî, çi tirk û kurd, çi ereb û arnawid, çi çerkez û boşnak, di nav şer de bûn.

şer, şerê man û nemanê bû, yê agir û şewatê, yê li ser Pira Siratê bû. şer

xurt û bêeman, xed ar û kambax, bi bahoz û tofan bû. Wî herkes, her welat û dewlet, her gel û netewe, her kes û şexs dabû ber xwe û ber bi gorê dibir. Wê rojê, wî em jî dibirin.

Rastiya wê rojê weh

a bû. Lê ji aliyekî ve jî gotina te ye; şer xewnek e, kabûsek e. Tê de heş û

mêjî, mantik û wîjdan nîn e. Tê de hîsên xweş ên biratî, wekhevî û dostiyê nîn in. Bi tenê tê de berberî û dijminatî, lêdan û xirakirin heye. Belê, ew kabûs e, bi ser merivan de tê, beden û canan dikuje, giyan û ruhan dişe- witîne, însanan û însanetiyê k avil dike û dere. û gava kesên ko li pey kabûsê mane, jê hişyar dibin, ew hew dikarin mîna berê bijîn. Nîvmirî, zîz, kesertijî, çavê wan li ser riya mirinê, ew jî êdî bi tenê rojên xwe yên »mayî«  
temam dikin da ko bikevin pey kabûsê û herin...

Wê roja zozanê çiyayên Torosê, em li ser riya eniya şer, bi gotina os-

maniyan »şark Cephesi«  
bûn. Sal 1915 bû. şer pir germ bûbû. Agirên şer pêl bi pêl bi ser welêt de dihat. Welat bûbû dûjeh, meriv tê de difetisîn, dişewitîn. Herkesî ji xwe û ji der û dora xwe dipirsî; çima? Ji bo çi? Ji bo kî- jan amanc û hedefan? Bi sed hezaran, bi milyonan meriv dihatin kuştin, xwîn d iherikî, bajar dişewitîn, xirbe dibûn... Lê çima? Ji bo min û me kur- dan jî bersîv nediyar bûn. Em ne ji rewşa welêt û kargirên wî ittîhatçiyên razî bûn ne jî ji rewşa kurdan û Kurdistanê. Siyaseta ittîhatçiyên hem li d ijî welatê Osmanî he m jî li dijî Kurdistanê bû. Lê çare nîn bû. Em di nav şer de bûn. Welatê Osmanî welatê me bû jî. Diviya me ew bipolarasta. Loma kur- dan jî, ji bo parastina welêt, çek hildan û ketin nav refên ordiya Osmanî. Em, kurd û bi sedan endamên malbata Bedirxanpaşazade, ketin ber bayê şer û her yek bi derekî de çûn. »şark Cephesi«  
bû para min. Min cilên eskerî li xwe kirin û ez bûm zabî. Di destpêka şer de, Stembolî, rûniştevanên Stembo lê, nedîçûn şer. Lê gava xeb erên nexweş ên eniya aanaqalê hatin û hejmara miriyên wê eniyê gihîştin sed hezaran, birînd ar bûn çar

sedhezar, hingî çek û p ûsad bi Stemboliyan jî hate girêdan û ew jî ketin nav refên şer.

Wê roja çiyayên qaîm û kevnar ên Torosê, em li rê bûn, ber bi »şark Cephesî«, ber bi qeda û bela, ber bi mirinê, diçûn. Stembol, bav û diya min, mal û malbata min, şehriban, Canan, bîhna beden û hêtên wê û gustîlên me li pey mabûn. Gotineke kurdan heye, dibêje; me berê xwe da oxirê,

90

pişta xwe da felekê. Lê belê, wê rojê me bervajiyê vê gotinê dikir; me pişta xwe dida oxirê, berê xwe dida feleka xayin û fetbaz...

Tabûra ko Celadet pê re ye û ji bo bîhnvedana çend rojan, li zozanên Toro sê, li quntara çiyayê, kon vedaye dê niha, dîsan, bikeve rê. Topên gi- ran ko ew dib in eniya şer, hinekî ji konan dûr, rêzkirî ne. Ker û hêstir, ga û gamêş, qantir û bergîrên tabûrê, li ber devê qelîşekeke çiyayê, diçûn. Ji

konan dûr, li jêr, gund, xanî, rê û xaçerê dixuyin. Jiyan îro, hê nû, bi aramî û bi hemû bedewiya xwe, hişyar dibe. Mîna ko jiyan ne di nav şer

de ye, mîna ko roj ne ya şer e. Jê ewçend bi dûr, ewçend cihê, jiyan li vir

xwe li rojeke nû digire.

Lê Celadet û tabûra wî dê bikevin rê, tabûr xwe dide hev, kon radibin,

çek tîr girêdan, heywanên barên giran tîr şidandin, zîn li hespên kumêt û qemer dikevin, teng û qûş li wan tîr şidandin. Tabûr li rê ye, ew ê xwe li eniya şer bigire, xwe dirêjî aliyê din ê şer, şewat û mirinê bike... Mirin

dikeve rê...

5

Mirin dikeve rê...

aare nîn e, Celadet û hevalên doralî çî jî bikin, hew dikarin eskerê birîndar ji mirinê vegezin. Birîna esker xedar e, hûr û rûviyên wî

derketine der, ji eniya wî xwîn tê, çermê aliyekî rûyê wî rabûye, hestiyên spî yên rû dixuyin. Libasên eskerî yên li ser vî eskerê xort lîme lîme

bûye. Jê bîhna xwîn, xwîdan, herî û barûdê tê. Jê bîhna mirinê tê. aare

nîn e, ruhistîn li ser qirikê siwar bûye. Eskerê bênav, bêmîşan û bêsiûd li

ber candanê ye.

Esker, bi xîreta xwe ya dawîn, çavên xwe, hêdîka vedike, li çavên ko ji

jor lê dinihêrin, mêze dike. çavên wî yên kelgirî, bi zîzî, bi hawar, li Celadet dinihêrin. Agir bi dilê Celadet dikeve, kezeba wî dişewite. Celadet dikare çi bike?.. Ew jî li kesên doralî dinihêre. Tu kes nikare tu

tiştî bike; ne bijîşk û kargerên tenduristiyê hene, ne derman heye, ne alet

hene, ne wasiteyên guhastinê hene û ne jî quwet û taqeta alîkariyê...

Mirin ketiye rê, ew ê vî eskerê ciwan jî, mîna bi sed hezaran eskerên din, bide ber xwe û bibe. Mirinê dora wan girtiye, ji her derî, her wext, bi ser wan de tê.

çavên eskerê bênav, hêdîka, tên girtin. Sînga wî giran giran radibe. Zimanê wî derdikeve û bi giranî li ser lêvên zuwa digere.

– Ev tî ye, em hinekî av bidinê, yek ji kesên li ser esker sekinî dibêje. 91

BÎR A Q ED ER Ê

Dilê wî dişewite, hinekî av bidinê, bila tiya wî bişkê.

– Na, na, av jê re ne baş e, yekî din dibêje.

– De dirêj mekin, avê bidinê, Celadet, bêyi ko çavê xwe ji esker bizivîrîne, dibêje. Avê bidinê, jixwe ew li ber mirinê ye, qet nebe, bila ewtî nere diyarê rehmetê.

Celadet hê weha dipeyive, ji aliyê derve dengê din tê;

– Cîh vekin, cîh çkin, sê birîndarên giran tên.

Tu wan rojên min ên ko bi rengên mirinê hatibûn risand in, bi bîra min tînî. Tu nefesa mirinê, hilma mirinê bi bîra min tînî. Hingî ez kumandarê qer- ergahê bûm. Konê me yê eskerî navenda îdara şerê kambax bû. Lê ne bi tenê weha, kon cihê razanê, xwarinê û dermankirinê bû jî. Hertim li wir çend birîndar hebûn û hertim piraniya wan çend birîndaran bi axîn û nalîn, li ber çavê me, dimirin. Li qerergahê, yanê bi qewlê kurdên me yên başûr, li meqerê, zêde kes

nîn bûn. Herkes çbû qada şer. Lê çûn û hatin pir bû. Nemaze hatin û çûyina birîndar û miriyan. Qîmeta meriv ketibû bin lîngan, bûbû pênc pere. Roja ko miriyên me hezarek yan çend hezar bûna, hingî zabitên giregir kêf dikirin û digotin; »Müthîş bîr şey, zayıatýmız bugün çok az.« Belê, te fahm kir, miriyên wan wê rojê pir kêmbûn!..

Mixabin e ko min bîranînên xwe yên wan rojan nenivîsîn. û min ew kurte-notên xwe yên ko min li vir û li wir nivîsîbûn, şewitandin... Eger ew niha hebûna, wan ê gelekî alîkarî li te bikirana. Ji wan rojan bi tenê çend rêz di rûpeleke kovarên min de hene. Niha nayê bîra min ka ew kîjan kovar û kîjan hejmar bû, lê li wir min behsa birîndarekî kiribû. Birînen birîndar xedar bûn û tu kes nîn bû ko alîkarî lê bike. Kurdan gotiye, »konê reş kê- maniyê qebûl nake.« Lê li wî konê me tu tişt nîn bû. şer, mîna hûtekî, her tişt xwaribû, qedandibû. Ez bi kêr û meqesan ketim ser birîndar, minbirînen wî derman kirin, bi derzî hûr û pizûrên wî »dirûn« û ew danî aliyekî da ko ez vegerim ser birîndarekî din. Belê, ez bûbûm bijîşk!.. Min bi tenê ew birîndar ji mirinê xelas kir. Birînen wî cebirîn û ew hate ser xwe. Di nav wan sê salên şer de, hingî, bi tenê hingî, min xwe mesûd hîs kir û ez bi bi- jîşkiya xwe serbilind bûm.

– Korkunç yorgunum, şyle on-onbeş dakika uzanaca

đý

m...



Celadet westiyayî ye. Bêrawest, du roj û du şevan xew neketiye çavên

wî. Êdî tu taqeta wî nemaye ko ew bixebite. Ew xwe ji textê ko esker li

92

serê dirêj bûye, dide alî û ber bi quncikeke kon der e. Li wir çend text li

kêleka hev rêz kirî ne. Celadet ber bi yê herî koşê ko li kêleka singekî ye,

dibe. Lê berî ko ew xwe li ser text dirêj bike, ew ji berîka hundirîn a qapûtê xwe nama ko bavê wî jê re şandiye derdixe. Ew, tevî qapût û

potînên x we yên eskerî, xwe li ser text dirêj dike û dest bi xwendina na- ma bavê xwe dike. Nama Emîn Alî Beg bi zimanekî xweş ê osmanî hatiye

nivîsîn û gelekî dirêj e. Ew di namê de behsa diya Celadet Semîha Xanimê, zarokên din ên malê, ap û metên Celadet ên kal û pîr ko li

Stembole mane dike. Ew hemû baş in, »Di sihet û afiyetê de ne.« Safter

û Meziyet mezin bûne. Safter danên êvaran kursiyekê davêje ber devê

bîra bexç û li wir rûdine û klasîkên fransîzî, bi fransîzî, dixwîne. Wî şî- hîra Charles Baudelaire »le Balcon« û şîhîra Alfred de Vigny »La mort du loup« jiber kirine û wan ji malê re dixwîne. Heçî Meziyet e, bûye stran - bêjeke yekta. Ew stranên kurdî, osmanî, fransîzî û farisî, »bi dengê x we yê

mîna qedîfe« dixwîne. Gava ew stranên xwe dixwîne, hemû Kiziltoprak

lê guhdarî dike.

Emîn Alî Beg di nama xwe de hin gotin û henekên wê rojê yên Stembole jî nivîsîne. Celadet bi ken, car bi car, wan gotinan dixwîne;

»Kadýkoy vapurlarý

nda tenha yer bulmak için ya sihirli kıyafetine girmeli  
yahut bol sarmý  
sak yemelidir.« Emîn Alî Beg hin henekên li ser şer jî  
nivisîne; »Den izleri kurutmak suretiyle düşman taht-il bahirlerinin  
elde edilmesi meselesi müfekerat-ý  
avam kamarasý  
nda mevki-i mü zakereye  
konulmuştur.... Suya düşen sulh kelimesini taht-ý bahirler çý  
karacak-  
týr...« Bavê Celadet bi rewşa wî û hewcedariya wî ya bîhn vedanê  
dizane.

Celadet pir bi henekên ko bavê wî nivisîne, dikene.

– Bavo, ax Bavo, ew bi keser dibêje. Di namê de, piştî henekan, li  
ser rewşa Stembolê jî hin rêz hene. Emîn

Alî Beg nivîsîna rewşê ji bîr nekiriye. Jiyan pir biha bûye,  
wapûrên Kadikoyê niha gelek tenha û bêkes bûne, kolanên  
Stembolê bêdeng bûne, buhayên tiştan pir û pir zêde bûne. Bihayê  
zêr di sedî de dused- pêncî zêde bûye, bihayên tiştan, bi gelemperî,  
hezarûşest caran zêde bûye, li bazarê dirav nemane, kirîn û firotin  
pir kêmbûye, xwarin û

vexwarin nayên dîtin, hema çî bigire li her malê şîn heye. Stembolê  
reşa

xwe girêdaye...

Celadet weha namê dixwîne û hêdî hêdî di xew re dere. çavên wî  
tên

girtin û name bi hêdîka dikeve ser sînga wî. Li kêleka xewa mirinê,  
ew jî

dikeve nav xeweke kûr û giran.

93

BÎR A Q ED ER Ê

6

Celadet ji xeweke giran hişyar dibe. Ber destê sibê ye, dinya nû ronî  
dibe. Celadet ko bi kincên xwe yên eskerî razaye, hêdî hêdî xwe

dilivîne û li dora xwe dinihêre. Li odê, ji wî pê ve, kes nemaye. Roja eskerî û şer, ji bo esker û seraskeran, ji zû ve ye ko dest pê kiriye. Ji derve dengin tîn. Welê dixuye ko zabit û seraskerên ordiya Osmanî xwe didin hev û haziriya roja nû dikin.

Roja nû... ko Ruhistîn wê çend hezar eskeran bide ber xwe û bibe?.. Gava Celadet radibe ser piyan û destemala xwe ya dirêj davêje ser milê xwe û ber bi derî de dere, ew, bi deng, weha difikire. Gelo qûtê Ruhistîn ê wê rojê dê çiqas be? Belê, qût ne tiştêkî din... Lê êdî Celadet jî hînê vê jiyane bûye. Ew jî êdî bi aramî li mirî û birîndaran dinihêre, bi aramî behsa mirinê dike. Gava nûeyên mirin û kuştinê tîn, ew, hew mîna berê, li ber wan dikeve.

Celadet deriyê mezela eskerî vedike û derdikeve der. Bi qasî bîstekê, ew li ber derî radiweste, dest û milên xwe diguvişîne. Textê wî yê razanê, mî- na teht hişk û sert e. Ew carina, bi qewlê fransîzan »gymnastique« dike, lê ew zêde nikare xwe bilivîne, bilebitîne. Kar û şixulên wî her li garnîzona navendê ye. Tevî ko ew gelekî bala xwe dide xwarina xwe, ew qelew dibe. Ew hinekî li dora xwe dinihêre. Hewşa garnîzonê gelek fireh e. Garnîzon mîna keleheke biçk hatiye lêkirin. Li ser dîwaran cîhên nobedaran hene, deriyê mezin ê garnîzonê ji hesin e. Hinekî ji mezelên zabitan bi dûr, bîreke mezin li hewşê heye. Di destpêka şer de, eskeran ew bîr ve- daye. Bîr bûye navenda garnîzonê; ava vexwarinê ji bîrê tê kişandin, es- ker li kêleka wê kincên xwe yên tijî kê û sipî dişon, zabitên mezin ên

kuştî li wir tîn şuştin û kefenkirin, danê sibê û êvaran, zabit li kêleka wê

dicivin û sohbeta rojê dikin. Bîr bûye ya enî û qada şer.

Celadet, bi gavên giran, ber bi bîrê dere da ko dest û rûyê xwe bişo.

Li

aliyê din ê bîrê, çend zabit li pê, paşiya wan li Celadet, bi dengê berz, sohbet dikin. Ew Celadet nabînin. Celadet radihêje dewla ber devê bîrê

da ko ji bîrê avê bikişîne. Lê dewl tijî av e, yekî av kişandiye û welê hîştîye. »Bextê ç«, Celadet bi ken dibêje, li ser totikan rûdine û dest û rûyê xwe

dişo. Kêliyêkê, bi herdu destan, ew bi ava sar rûyê xwe dişo. Ava sar hinekî wî zînde dike û xewa li ser çavên wî davêje. Serşoka mala wan a Kiziltoprakê û ew demên rengîn ên serşokê tîn bîra wî. Niha? Niha ew çiqas ji wir, ji wan bi dûr ketiye!.. Ew ê bikaribe, dîsan, xwe bi wir û bi wan deman bigihîne?

Celadet bi hêdîka radibe ser piyan, bi destemala dirêj dest û rûyê xwe

94

zuha dike. Di wê navberê de çend gotinên sohbeta zabitên li aliyê din ê

bîrê bi ber guhê wî dikevin. Di sohbeta wan de gotinên »lo, lo... zo, zo«

derbas dibin. Celadet bi dîqet guhê xwe dide wan û ber bi wan dere.

Belê, lo kurd bûn, zo jî ermen... Wan zo qir kiribûn, dor hatibû loyan... Wan zabitên wê rojê qala qirkirin û mirinê dikirin.

Dewletên mezin ew diku ştin, wan jî zo kuştibûn, lo li dorê bûn.

Hingê em li Bakuyê, li eniya Qevqesê, bi gotina osmanî li »Kafkas Cephesî« bûn. Havîna 1917-an bû. Şer bi awayekî boş dewam dikir lê êdî xuya bûbû ka kî dê zora kê bibe. Yekîtiya Dewletên Amerîkayê, ji bo pişt- girtiya ingilîz, fransîz û îtaliyan, ketibû qada şer. Bi vê biryara Amerîkayê, êd î serketiyên şer baş diyar bûbûn.

Dewleta Osmanî şikestên xedar xwaribû, hew dikaribû li ber xwe bide. Li her cepheyê şikest hebû û hej- mara miriyan digihîşt sed hezaran. Li welatê Qefqasê jî, bi deh hezaran es- ker, bêyî ko tu tiştî bikin, di nav berf, sar û seqemê de, bêzar û bêziman, bê gor û goristan, li welatekî xerîb, serê xwe danîn. Ittîhatç bi ser ketibûn; dewlet ji hev diket, têk diçû. Ittîhatç bi armanca vegirtina hemû Qafqasê û Asyayê, welatê b av û kalên xwe, ketibûn rê. Mirîşkên birç di xewna xwe de garis didîtin... Lê xewna wan qulipî ser kabûseke ewçend xedar ko pê hemû welatê Osmanî leqiya, hejiya û di dawiya dawîn de jî winda bû, ç.

Di gel vê hindê, ittîhatçî hê jî dev ji fortên xwe bernedabûn. Ew ne ji kera

xwe peya dibûn ne jî ji pozê xwe mû dikişandin. Ew leheng û qehremanbûn... Wan di hatinê de zo qir kiribûn, niha di vegeerê de, dor a loyan bû... Heçî qetliyama ermenan bû, rast bû. Bi sed hezaran ermen, kal û pîr, zar û zêç, jin û mêr, bi dek û dolab, bi plan û bernamên ittîhatçîyan, ji mal û warên xwe hatibûn veqetandin û di riyên dirêj, asê û çetin ên koçan de, bidestê çeteyên ittîhatçîyan hatin kuştin... Pêl bi pêl, li ser hev, bi hovîtî. Serekên ittîhatçîyan ji diz, keleş, pêxwas, mêrkuj û nezanan, bi navê »Teşkilat-i Mahsus«*,* çeteyên çekdar ava kiribûn da ko bi wan ermen qir bikin, reh û rêên wan biqelînin. Ittîhatçî di ê planê xwe de bi ser ketibûn.

Gava em ji çiyayên Torosan, ber bi qada şer dihatin, min bi xwe, bi çavên

xwe, li ber devê riyên, di kort û çahlên şikêran de, bi sed an cendekên er- menên mirî dîtin... Min ev tişt hemû ji Mistafa Kemal Paşa re, di nama ko min jê re şand de, bi kitekit, behs kir. Dawiya mirin û kuştinê heye? Payanên kîn û nefretê hene? Ma xwîn bi xwîn tê kuştin? Merivên ko rê û rêûna xwe li gora kîn û nefretê bi rê dixin, bivê-nevê, di nav kîn û nefreta ko wan çandiye de digevizin...

BÎR A Q ED ER ê

Ittîhatçiyân xwîn rijandibû û wan xwîn, ne bi avê, bi xwînê dişuştin. Celadet dere nik zabitan û bêdeng li wan guhdarî dike. Gotin li ser ermen

û kurdan e. Zabitekî simbêlqît, bi ken, dibêje;

– Tý

pký Zo-lar gibi Lo-lara da iyi bir ders vermek lazý

m...

– Nasý

I verecekmişsin, ver bakalý

m... Ben de Lo-yum...

Bêyî ko Celadet xwe bilivîne, yan jî xwe eciz bike, bi ken, bersiva zabit

dide. Zabit hinekî şaş dibin. Zabîtê ko qala zo û loyan dike, hinekî xwe dilivîne ko bersivekê bide, lê ew nizane çi bibêje.

– Estagfirullah, ew dibêje, Celadet Beg, em dizanin, tu stembolî yî... – Belê, ez Stembolî me, lê kurd im jî... Celadet destê xwe yê çepê datîne

ser kevirên d îwarê bîrê û bi aramî dibêje... ji bîr mekin, merivên ko rê û

rêûna xwe, li gora mirin û kuştinê, bi rê dixin, bivê-nevê, di nav xwîna

xwe de digevizin...

96

FOTOGRAF 6: »Jeladet Alî; he suffers from the inevitable effects of long residence and training in constantinople, but he has the makings of a good man...«

1

şer, şerê cîhanê ê mezin, careke din, qayida xwe ya esasî diyarî însan û însaniyetê kir; merivên ko rê û rêçûna xwe li gora mirin û kuştinê bi rê dixînin, di nav xwîna xwe de digivizîn. Dûzan û ahen-

ga cîhanê, ji binî ve guherî, dewletên biserketî, Ingilîstan, Franse û Italya, niha, dûzaneke nû, li gora armanc, hedef û xwestekên xwe, d idin cîhanê.

Alemanya, Rûsya, Dewleta Osmanî û alîgirên wan têk çne, dûzana wan

hilweşiyaye, ax û tixûbên wan ji hev ketine. Nalîna şînê û bîhna dû û dû -

manê ji wan radibe.

Di nav vê agir û şewatê, dû û dûmanê de, qîmeta fotograf û wêneyan,

yekcar zêde bûye. Pevçn û şer, mirin û windabûnê, yekcar, fotograf kirine tişteki esasî yê jiyana civakî. Bi hezaran, deh hezaran, sed hezaran û milyonan meriv di şerê bêhempa de, di berî û deştan, newal û geliyan, kort û kozikan de, di çiya û dahlan de, bê gor û goristan, bê kefen, mirinû hatin kuştin. Ew bê nav û nîşan, bê şop û şûv, bê wêne û foto çn. »Qet

nebûya, hin wêneyên wan hebûna...« Bi dû şer re, însaniyetê ji sed hezaran malên xwedî mirî û kuştî qîrîn û nalînên weha bihîstin. »Qet nebûya hin fotoyên wan hebûna, ew li ser dîwar, mase û refên kitêban li yên mayî binihêrtina... Yên ma yî jî li wan binihêrtina û bigotina, bavê me, mêrê me, birayê me, mamê me, xalê me ev e... ew weha bû, jiya û mir...«

Mirinê nemiriya fotografê bi bîr aniye. însan û însaniyetê niha baş bîr

pê biriye ku, fotograf vejandina miriyan e, herwekî ko filîsofekî fransiz

gotiye, vegera miriyan e. Fotograf di navbera herdu cîhana de çûyin û

hatin e, hem bîr bi nemiriyê, hem bi mirinê birin e. Fotograf rawestand -

ina wextê, dewr û dewranê ye, li dijî dem û wextê şerekî bêhempa ye.

Loma jî, niha, meriv li her aliyê dinê, li ber deriyên studyoyên

97

BÎR A Q ED ER ê

wênekêşan, di rêzê de ne. Miriyên wan, bêyî ko li pey xwe tişteki bihêlin,

bê nav û nîşan, bê rû û sûret çn. »Qet nebe, bila ew welê nerin...«

Lo ma

jî foto û fotokêşê, niha, yek ji meslegên herî baş, herî bi qezenc, herî maqbûl û herî bi »sewab« e. Niha, piştî şerê kambax, herkes li pey rû û

rûçikê xwe yê nemir e. Herweha rêzên dirêj li ber deriyên studyo yên fo- tografkêşên Stembolê jî hatine pê. Stembol, payitextê Dewleta Osmanî ya têkçûyî, jî, piştî mirina dewletê, niha ketiye pey nemiriyê û xwe li ser

kaxizên reş û spî »qeyid« dike.

Mîna herkesî ko xwedî îmkan in, malbata Bedirxanpaşazadan jî xwe li

ser kaxizan qeyd dikin. Hem mêr, hem jin, lê pirî caran ji hevûdu cihê. Ew ji deverên şer, mirin û kuştinê vegeriyane û li milekî xwe ji nû ve

didin hev û li milekî jî, bi qasî ko ji destê wan tê, xwe dikin nemir û wêne

li ser wêne zêde dikin.

Fotografê şeşemîn a romana di wan rojên hilweşîn, keft û

leftên dûzana nû û demên rêzên dirêj ên li ber studyoyên fotokêşan de tê kişandin. Lê ne li Stembolê, li Kurdistanê. Ne di studyoyeke fotokêşekî

de, li bexç maleke kurdî. Ne ji aliyê osmanî yan jî kurdekî, lê ji aliyê zabitekî ingilîz, Major E. M. Noel.

Li ser fotoyê du kesên nas hene; Celadet û birayê wî Kamuran Alî



Bedirxan. Herdu li pê, li kêleka hev ûdu, li ber sitûneke stûr a şaneşînekê sekinîne. Dar û berên bexçe bergeha fotografê dixemilînin. Celadet li ka- marayê, Kamuran li aliyê bex ç dinihêre. Herdu jî bi simbêl, bi kincên si- waran, lê bi qrawat in. Porê herduyan jî, bi paş de, şehkirî ye. Celadet bi qasî çend tiliyan ji Kamuran dirêjtir e û bi qasî çend tiliyan li pê ş wî rawestayê. şivekî siwaran di destê Celadet de ye. Kamuran, dest ber bi

jêr, bi awayekî serbest sekiniye. Ji rawestana herduyan dixuye ko Celadet bêtir xwedî berpirsiyarî û gotin e. Herdu bi rêz û rêzdarî sekinîne. Awirên wan ciddî, nêrîna wan kûr e.

Kincên ko wan li xwe kirine, nû ne û ji kincên siwar, rêwî, nêçîrvan û seyidvanên îngilizan in. aaketên herduyan jî, ji navtengê, bi kemerekê, hatine şidandin. Pantolon ji jor fireh, ber bi delingan teng in. kincên herduyan jî mîna hev in. Kinc ne yên mintiqê ne, ne yên welatê Osmanî ne jî. Kincên wan yên ewrûpayiyan in. Yanê du kurdên ji maleke navdar a kurdî, bi cil û bergên ewrûpayî, li welatê bav û kalan in. Du Stemboliyên kurd li welatê kurdan in.

Ji awir û nêrîn, cil û bergên wan, ji şiva destê Celadet dixuye ko ew bi wezîfene girîng rabûne û rêwî ne. Ew, hazir, xwe şidandî, ciddî, li ser rê ne.

98

Di geremola piştî şer de, di keft û lefta avakirina dûzana nû ya cîhanê

de, ew jî li ser hin riyên in, li pey hin doz û dawan in. Fotografa şeşemîn

a romana Bîra Qederê, bi qasî mistekê be jî, rewş, alozî, dawê û dozên

piştî şerê cîhanê nîşan dide. Fotograf, bi bergeha xwe ya xuyayî û bi aliyên xwe yên nexuyayî, hem riyên nû yên li ber Celadet û Kamuran nîşan dide

hem jî riyên nû li ber romana vedike.

Tiştêkî din ê bergehê jî heye ko meriv divê, ji bo tamamkirina salox-

danê, behs bike; ji ber û pelên daran xuyaye ko dinya germ e, wext, wex-

ta dar û ber, gul û kulîlkan e.

2

Dinya germ e, wext, wexta dar û ber, gul û kulîlkan e. Tîrêjên tava danê êvarê yên Stembolê, ji pencera oda otêlê, bi ûsil, xwe digi- hînin hundir.

Canan, hêdîka, ji ser cîhan radibe û bi gavên nerm ber bi pencerê dere.

Celadet, di nav cîhan de dirêjbûyî, lê dinihêre. Rojêke havînê ye. Celadet û Canan li otêla navdar a Stembolê Pera Palasê, di odeyeke fireh de ne.

Hema çi bigire, ew hemû roj li odê, di nav cîhan de mane. Bi tenê, destê sibê, ew derketine û li kolanên teng ên Pera û li ser Rue du Pera ya firehgeriyane. Bi tenê, bêdeng û bêyî qîreqîra şêniyan. Bi rêberî û hevaltiya segû pisîgên kolanên. Ji vê gera sibê pê ve, ew her li o dê mane. Di nav cîhan

de, tazî, peregende, bi kel û coş. Bêyî gotinên zêde.

Celadet, kêlîkekê, li Cananê dinihêre. Paşê ew xwe dirêjî ser masa biçk a kêleka textê razanê dike, şûşa şaraba spî ya taybetî ya Pera Palasê

werdigire û jê çend dilopan bera piyana xwe dide û wê vedixwe.

Tahmeke tirşokî a xweş û hênîk devê wî tijî dike. Tahm di dev de, ew serê xwe datîne ser bahlîfê û bîskekê çavgirtî dimîne. Dinya niha çiqas sakîn

û aram e! Ew çiqas xweş e! Mîna ko ew rojên şer berî niha bi sedan sal bûn. Ew niha ewçend dût, ewçend li pey mij û dûmanê, li pey perda xewn û xeyalan mane... Dinya çi ecêb e! Tahma tirşokî ya vê şarabê û ya xwînê çiqas ji hev cihê ne. Bîhna xwîdana vê odê û ya kozikên şer çiqas ji hev dût in! Lê meriv van hemû tiştên ji hev pir cihê, li gora şert û mercan, qebûl dike û dijî. Bi qasî dinê, însan jî ecêb e.

Celadet dîsan xwe dirêjî masê dike û îcar ji serê cixareyekê ko bi pelekî taybetî ya fransizî »la paix« pêayî ye, digire û wê bi heste vêd ixê. Celadet bi destê xwe yê çepê bahlîfa xwe dikişîne ber dîwêr, piştta xwe didiyê û hem cixara xwe dikişîne hem jî li Cananê û tîrêjên rengdayî yên li pey pencerê dinihêre. Pelên cixarê yên la paix, yanê yên aştiyê li van rojên

99

BÎR A Q E D E R Ê

piştî şer û qiyametê tîn. Digel ko hêlekana nediyariyê hê jî dere û tê, dinya westiyayî îro aş bûye. Dengê top û tifingan hatiye birîn, ordî vek- işiyane kozikên xwe, dûmana barûdê bi esmanan nakeve, xwîn mîna lehiyê naherike, îro ji şînen ko hê jî dewam dikin pê ve, dengê nalîn û qîrînan hatiye birîn, ruhîstîn ketiye xeweke sivik. Herkes sakîn, birîndar, westiyayî û aram, li xwe vegeyriyaye û birînen dil, beden û ruhê xwe dicebirîne. Celadetê ko bi pelê cixarê yê la paix cixara pêayî dikişîne, li Stembolê, mal û malbata xwe, yar û dostên xwe, li evîn û evîndarên x we vegeyriyaye.

Gava ew hê di nav seqem û berfên sar û refên germ ên şer de bû, hê hingê, wî xeyala Stembol, Pera Palasa navdar, roj û şevên germ û nerm ên Pera Palasê kiribûn. Hê hingê wî soz dabû xwe, eger ew sax û silamet ji şer, sar, serma û pûka Qafqasê xelas bûya, wî dê, çend roj li ser hev, bêyî ko derkeve, tevî evîndara xwe, li Pera Palasê d erbas bikira. Mirinê, şert û mercên kambax ên şer soz û qewlên weha xweş pê dabûn dayin. Wî niha, bi coş û daxwaz, qewlê xwe bi cîh danî.

Digel ko Pera Palas niha hertim tijî bû û bi taybetî serokên hêzên dagîrker ên Stembolê li wir bi cîh bûbûn, wî odeyeke xweşik ko ber bi aliyê zeryayê bû, ji bo sê roj û şevan, veqetandibû, Canan jî wergirtibû û hatibû.

Herê, Pera Palas... ev avahiya spehî ko berî min bi salekê hatibû dinê û ji bo rêwiyên ewrûpayî ko bi Orient-Expresê dihatin Stembolê amade bûbû, navenda Rojava û Rojhelatê bû. Hemû »kor-diplomatique« welatên Ewrûpayê li wir bûn. Paşa, kumandar,

wezîr û sadrazamên welatê Osmanî li wir bûn. Karên dewletan û çerxa felekê li wir digeriya. Qedera gel û mile- tan li wir dihate pê. Xwarin û vexwarinên herî xweş li wir bûn. Meyên »Medoc Superior, Hochheimer, Chianti« û şampanyayên »Cordon Vert, Veuve Clicquot« li wir bûn. Musîka Osmanî ya yekta û balo, dans û valsên bêhempa yên ewrûpî li wir bûn. Asansora yekemîn a bi elektrîk li wir bû. Bergeha xweştirîn a Bo Ğazîyê, bi gotina ewrûpayîyan Bosporê, li wir bû...

Hevrê û rêberê min ê evîn û evîndariyê Ovidius li derekî jî weha gotibû; »Meriv gurên hev in...« Di wan rojên tarî yên nêîra Ruhistîn de, ez gelek caran li vê gotinê fikirîm. Meriv, bi rastî, gurên hev bûn, mîna guran diketin gewriya hev û cîh li hev dikirin gola x wînê. Hê hingê, ez li Pera'yê, cîhê gurên mezin difikirîm. Hem ji bo qesta felekê hem ji bo fahmkirina çerxa dinê û şerê guran.

100

Lê, wê roja ko tu niha bi kurtî behs dikî, ez li gotineke din a Ovidius difikirîm; »Evîn bi jîna şervanekî dişibe, ew ne karê tirsokan e.« Jîn bi xwe, ger di şer de, ger di aştî de, şer bû, jê re şervanî diviya. Bi tirsokî û dudilî jîn ned- ibû jîn...

Canan, tazî, li kêleka pencerê sekiniye û li dever dinihêre. Celadet jî li wê. Ew wê ji kêlekê dibîne. Canan hinekî din xwe xwar dike. Şeq û hêtên wê yên spî û zirav hinekî din vedibin. Canan mîna sitûneke romî lihevhatî, mîna Afrodîteke jîndar spehî ye. Tîrêj zerahiyeke vekirî didin b edena wê ya ciwan. Pûrtên bedenê rengîn dixuyin. Porê wê ji mil û stû ber bi jêr dibe. Memik, bi gotina stranên kurdî, mîna purtaqalê, tijî û rakêşiyane. Navpişt, xêzeke xwar dikişîne û heta ber gurmikê tê. Gurmik, mîna ke- vaneke vekîşiyayî, mîna îspata gotinên Ovidius, bi hemû bedewiya xwe, li hêviya dest û tiliyan e. Gurmik, mîna navenda cîhanê, li wir, li ber pencerê ye. Ewçend ji Celadet dûr, ewçend li Celadet nêzîk!..

Piştî ko Celadet cixara xwe di xwelîdanka li ser masê de vedimirîne, ew radibe û dere nik Cananê. Ew wê, bêdeng, ji paş ve, hembêz dike.

Bo ð azî, yanê zerya, bi rengê xwe yê keskeşîn li ber wan e. Li milê din ê ðazîç'yê, li aliyê Anatoliyê, warên Celadet û Cananê dixuyin. Ji Bo kêlekê ve jî, saraya kevnare ya sultanên Osmanî Topkapi, li ser gir û di nav hêşînahiyeke boş de, dixuye. Li ser avê, keştiyeke dirêj û mezin, hêdî hêdî, ber bi aliyê jor, Zerya Reş, dere. Tîrêj li ser avê diçirûskin. Dinya di nav rengên vekirî de, çikvekirî ye.

Stembol, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, li ber lingên wan e. Stembol, bajarê xwedyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwedyê mizgeft, d êr û sîagogên bedew û rengîn ên herî xweş; x wedyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwedyê keleh, birc û sûrên bilind, dirêj û bêdawîn; xwedyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwedyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwedyê çayxane û meyhanên germ, esrar û heşîşxanên dûmantijî; x wedyê mal û kerxanên kufikî, medrese û kitabxanên zîvhêlî û neqîşandî; xwedyê tava germ, tîrêjên sor, heyva ron û stêrikên çirûsî...

Celadet li Stembolê dinihêre.

– Canan, mon chérie, li Stembolê binihêre, Celadet dibêje, bêyî ko xwe

bilivîne û destên x we jê bikişîne. Li îspata jînê binihêre. Di nav sînga şer de, ez her li vî bajarê ko gelekî bi min û qedera min di şibe, ko huwiyeta

wî jî bi huwiyeta min dimîne, difikirîm. Ez welê bawer bûm ko min ew

101

dinasî, min her alî, tişt û milê wî keşf kiribûn. Lê ez dibînim ko ez hê jî

wî nas nakim, min hê jî ew baş keşf nekiriye. Min, piştî şer, hîn çtir fahm kir ko ez nikarim bêyî Stembolê bijîm. Ev ne mumkin e. Stembol bajarê

min e, qedera min e, ez im...

3

– Dewleta Osmanî nikare bêyî Stembolê bijî,  
Mewlanzade Rifat Beg dibêje. Ev ne mumkin e, Stembol bajarê me  
osmaniyan e, ew  
em in... Lê, binihêrin ka ew îro ketiye çi halî...  
Mewlanzade Rifat Beg, r ojnamevanê lîberal ê navdar ê hemû  
welatê  
Osmanî, dostê Bedirxaniyan, muxalifê desthilatî û zordestiya rejîma  
dalo  
dloyê, li buroya rojnameya xwe »Serbestî«, tevî  
Ittîhatçıyan, li Ca  
çend dostên xwe, rûniştîye û ji wan re, bi dengekî ecizbûyî, bi tirkî,  
behsa  
rewşa dawîn a Stembolê dike. Celadet jî li wir, li wan guhdarî dike.  
Oda ko ew tê de rûniştine, biçûk e. Mewlanzade Rifat Beg li pey  
maseyêke dirêj a kevn, di destan de pênuşek, Celadet û yê din li  
pêş  
masê, li ser kursiyên çermîn rûniştine. Serê masê tijî kaxiz, kitab,  
rojname û kovar in. Ode tijî dixan e. Herkes cixare dikişîne.  
Esebiyeteke eşkere  
dixuye.  
– Belê, mutareka Mondrosê çêbû, lê ev halê îro, ne tu hal e. Diyên  
ko  
lawên xwe, jinên ko mêrên xwe li eniyên şer şehîd dane, îro, ji bo  
nanekî sed dîrhemî ko jixwe nayê xwarin, bi saetan, di serma û  
pûkê de, li dorê  
disekinîn. Hê jî, hebûn û zexîrên xelkê, bi navê »teklîf-î harb« ji  
destê wan, bi darê zorê tînin standin. Hê jî xelkê reben û bêçare di  
bin nîrê cendirme û polîsan de dinale. Hebûn, zexîre û tiştên ko ji  
xelkê tînin standin, di nav zabitên de winda dibe. Ew mîna malên  
bavê xwe wan dixwin... Herç dewlet e, îflas kiriye. Pereyên ko di  
dema Sultan  
Evdilhemîd de derketibûn, îro xelas bûne. Di dema şer de sedûpêncî  
mi-

lyon lîrayên kaxiz derkete piyasê, lê bêyî buhayê wan ê zêr... Ez çî bibêjim, pere nîn e, îdare nîn e, hukim nîn e, gerandina karê dewlet û

welêt nîn e, yekitî û yekbûn nîn e, azadî û serbestî nîn e, demokrasî û îh - saniyet nîn e û Stembol jî, dilê welêt, mêjiyê dewletê, ji dest çye. Hêzên

çekdar ên dewletên serketî, bi quwetên xwe Stembol îşxal kirine... aaxa ew dipeyive, rîha wî ya dirêj û simbêlên wî yên badayî, ber bi jor

û jêr, dilivin. Ew berçavikên xwe yên zirav ji çavên xwe derdixe, wan datîne ser masê, yek bi yek li dostên xwe dinihêre û paşê çavên xwe li ser

Celadet radiwestîne.

– Celadet Bey, îro, rojnamevanê me yê herî baş, herî xurt e, ew dibêje.

102

Wî do bendek nivisî û anî, lê guhdarî bikin ka ew di derekî bendê de çî dibêje.

Ew dîsan berçavikên xwe dibe çavên xwe, ji nav tomara kaxizan çend

rûpelan werdigire, rûpel bi rûpel li wan dinihêre, li derekî radiweste û

dest bi xwendinê dike;

»Kendileri kürklere büründüler, milletin derisini soydular.

Kasalarýna

õýt týktý

altý

n doldurdular, bizim ceplerimize ka

lar...«

Bi vî terhî, ew demeke dirêj beşina ji benda Celadet ji wan re dixwîne.

Ew rêzên pêşîn ko Mewlanzade Rifat Beg, bi tirkiya xwe ya gelekî xweş, xwendibûn, ne rêzên min bi xwe bûn. Min ew ji nivîskarekî

tirk wergirt- ibûn. Wî nivîskarî li dijî curumkarên şer Ittîhatçiyên bendeke gelekî xweş nivîsîbû û min jî çend rêz ji benda wî wergirtibûn... Mewlanzad e Rifat Beg, her mîna ko te got, rojnamevan û siyasetvanekî hêja û navdar bû. Merivekî lîberal, bi serbestî û azadiyê, heq û hiqûqê bawer bû. Ew gelekî dostê malbata me û bavê min bû. Piştî derketina me, li welatên xerîbiyê jî, em bi hev re bûn. Me bi hev re kar û şixul gerand in, bi hev re derd û ke- serên welatê xerîbiyê kişandin. û gava wî di destpêka salên 1930-an de, li Helebê wefat kir, bila yeqîna te ji Xwedê hebe, ew di nav bêkesî, neçarî, belengazî û rebeniyeke ewçend zîz de wefat kir ko ez bi salan pê êşiyam, dilê min pê şewitî. Ew alîm û ronakbîrê ewçend hêja û navdar di bin perda reş a bêkesî, nenasî û tenêtiyê de serê xwe danî axa rehmetê. Haya kesî jê nebû, şîneke layiqî wî çênebû, civateke hêjayî wî nehate gerandin, mîna gelek zane û ronakbîrên me, ew ji bîr bû û ç. Mêr dimirin, li pey wan nav diman, lê li pey Mewlanzade Rifat Beg ne nav, ne şan, ne şop, tu tişt ne- ma...

Ez vegeyriyabûm Stembola tev li hev. Rojên şer li pey mabû, lê şerekî nû

dest pê kiribû. Min kar, şixul, mal, dezgeh, pêwendî, hed ef û armanc di- viyan. Min ê çi bikira, berê xwe bida ku? Kurdan gotibû; teyr baş e, bi refêxwe re. Ez ê bibûma hevalê kîjan rêz û refan? Min xwendin û nivîsîn, îlim û îrfan, rojname û ko var hilibijartin. Min da ser vê riyê. Ez nikarîbûm bibûma paşa, zabî, tucar, dûkandar, karmend, hembal, berdevk, peyayê malê û xemxurê karên rojane. Ev kar û tişt li min nedihat. Ne bala min li ser wan bû û ne jî wan heyecanek dida jîna min... Lê nivîskarî, rojnamevanî, kar û dozên mezin, hedef û armancên bilind û pîroz heyecaneke bêpayan didan min. Ez, yan jî ez bira, mam û merivanên xwe jî bihesibînim û bibêjim em, bi bîr û dîtinên Roussaou, Dîderot, Voltaire û feylesof û

103



nivîskarên din ên şoreşên Fransayê, bi şîrên Ehmedê Xanî û Omer Xeyam û bi ders, tecrube û serpêhatiyên Mîr Bedirxan perwerde bûbûn. Ma meqîma xwe bi karên rojane dianî? Min refê xwe hilbijart... Hingî du mecmuahebûn ko li ber dilê me hemûyan pir ezîz bûn; Içtîhad a Abdullah Cewdet Beg û Serbestî ya Mewlanzade Rifat Beg. Gava min daxwaza xwe ya xe - batê, li cîhê Serbestî, ji Mewlanzade Rifat Beg re got, wî berçavikên xwe derxistin, ez hembêz kirim, »mükemmel, mükemmel« got û ez li aliyê din ê buroyê, li ber maseyeke biçk dam rûniştin. Bi vî awayî, min dest bi xe- bata rojnamevaniyê kir.

Serbestî, ji bo min, bû xwendegeheke bêpayan. Ew odeyên teng, tarî,

sar û kevn ên Ca

õ alo

õ luyê b ûn kahniya ronahî û zanînê, bûn warê

bikaranîna ziman û hînbûna nivîsînê. Ez qayide û prensîbên rojnamevanî û rojnamegeriyê, hîmên ehlaqê wan, şêwe û awayê xeb atê, çeşn û ûslibên cihê yên nivîsînê, li wir hîn bûm. Li wir, ez bêtir ketim nav fikir û baweriyên azad û serbest, min ferq xistin navbera x we û her celeb fikrên zordest... Rojnamevanî, herwekî nivîskariyê, huner û hunermendî ye. Meriv divê bihunera wê bizanibe. Meriv divê bi zimanê gotinên bêziman bizanibe, zi- manekî jîndar bide wan, wan bi xwîn û go şt, reh û hestî b ikemilîne, bala xwendevan bikişîne, wî zimanê lêkirî bi xwendevanan bigihîne, bikaribe kêr û kurt binivîse, di navbera yên girîng û yên negirîng de, yên girîng ûpêwist hilbijêre, kalîte û hêjahiyê bîne pê, êrîşker nebe, xwe ji neheqiyên bide alî, nebe sebebê şer, bîhtengî û xirabiyên, rojnamê ne ji bo hesûdî, zikreşî, paşgotinî, xirabî, xirecir, xirakirin û îspata cehaletê, lê ji bervajiyê, jibo perwerdekirin, pêşxistin û çiyî meriv, gel, netewe û welat, bilindkiri- na qada agahî û zanînê, pêkanîna awayekî baş ê biratî, samîmiyet û afirînê biweşîne. Dergaha Serbestî-yê ev qayide û yên mîna van ên roj- namevaniyê hînî min kirin. Di wan rojên nanezik,

nexweş ên yan pir sar, yan pir germ de, ruh û mêjîyê min bi tecrubên nû dewlemend bûn.

Serbestî rê li min vekir ko ez bikaribim rojname û kovarên ko min paşê,

li welatên dûr û xerîb derxistin, biweşînim. Eger ew tecrubên rojên Stembo lê nebûna, ne Hawar û kitabên wê ne jî Ronahî derdiketin. Ez ne bawer im ko ew ê bikaribûna derketina...

Piştî ko Mewlanzade Rifat Beg xwendina xwe tamam dike, ew dîsan berçavikên xwe derdixe û ji dostên xwe dipirse,

– Azizim, aynen boyle de

õil mi? Celadet Bey-in hal ve ahwal ile ilgili

soyledikleri do

õru de

õil mi?

104

4

– Azizim, aynen boyle degil mi? Emin Alî Bey-in hal ve ahwal ile ilgili soyledikleri dogru degil mi?

Kurdên bijarte yê Stembolê li cîhê K ûrt Teali Cemiyetî, li salona fireh

a Behçet Paşa Kona

õy

rûniştine û li gotara Emîn Alî Begê Bedirxanê guhdarî dikin. Gotar li ser hal û hewalê welatê osmanî û rewşa kurdan e.

Salon tijî ye. Zane, rêber, serek, paşa, zabit, dîplomat, alîm, nivîskar, rojnamevan, mîr, serekeşîr, axa, şêx û gelek kesên din ên ji cîh, war û

meslegên cihê yê kurd li wir civiyane. Kurdan li Stembolê rêxistineke

nû ya siyasî ava kirine; Kürt Teâlî Cemiyeti. Hemû kurd tê de ne û heye ko cara yekemîn kurdan, li wir, xwe dane hev. Serekê Cemiyetê Seyid Evdilqadir e, kurê serekê mezin ê kurdan

Ubeydullah Nehrî ko rêberiya serîhildaneke mezin a kurdan kiribû. Serekê duwemîn ê cemiyetê bavê Celadet, Emîn Alî Beg e, kurê serekê mezin ê kurdan Mîr Bedirxan ko rêberiya serhildana mezin a kurdan a 1846-an kiribû. Heyeta wan a îdarî jî, ji navên mezin û qedirgir ên kurdan hatiye pê. Kurd li Stembolê gihîştine hev da ko bi doz û dawa kurd û welatê kur- dan rabin, da ko di van rojên nezela ên avakirina dûzana n û de, ji bo kur- dan jî, çare û rê bibînin. Ew bi coş û heyecan ketine nav xebatê, civîn û civatan li dar dixînin, kaxiz û belavokan dinivîsin, heyet û merivan dişînin welêt û nik serekên dewletên biserketî yên li Stembolê, liq û komeleyên xwe li welêt ava dikin, rojname û kovar diweşînin... Têkçna dewleta Osmanî, li milekî, ew xemgîr kirine, li milekî jî, hêv iyên nû dane wan da ko ew bikaribin ji bo welatê xwe hin heq û hiqûqan bi dest xînin. Cemiyetê, avabûn û xebatên wê, çirûskeke nû ya ronahiyê vexistiye.

– Aziz dostlar, Emîn Alî Beg dibêje û ji cîhê ko maye, xeberdana xwe, bi tirkî, didomîne. Gotinên ko em dibêjin, dikarin rast bin. Ev ne girîng e. Ya girîng ew e ko em ê, li gora van gotinên rast, çi bikin... Em divê li ser vê yekê li hev bikin. Hê jî dewletek, hikumeteke Osmanî heye. Lê belê, hemû hikum û desthilatî di destê çar dewletan de ne; Amerîka, Ingilîstan, Franse û îtalî. Eger me dil heye, em, li gora gotinên xwe, bi ser kevin, hingî, bi baweriya min, em divê pêwendiyê gelekî xurt bi van dewletan re bînin pê. Yek ev. Ya duwemîn jî, ev dewlet kar û şixulên xwe, li gora prensîbên President Wilson, bi rê dixin. Ev pren sîb li

hal û hewalê me, li rewşa welatê me tîn. Em jî divê, kar û şixulên xwe, li gora van prensîbên pir esasî û pir girîng, bi rê xînin...

105

Welê dixuye ko ev halê mirov û mirovahiyê ye; gava tiştê li ber çavê mirovan dibe û diqewime, mirov baş bala xwe nadiyê, wî ba ş nabîne. Paşê, piştî bûyerê, mirov wî çêtir dibîne, paşê qîmet û giringiya wê fahm dike. Lê hingî jî, mirov nikare, wî tiştî, digel her kitekitê, ji nû ve, eynî mîna berê, bibêje yan jî binivîse. Herwekî xewnan... her çawan ko mirov nikarexewnan, eynî mîna wan bi xwe, ji nû ve, bîne zimên, bûyerên bihurî jî, ji nû ve, mîna xwe venagerin. Mirov lê zêde dike, li gora rewşa xwe ya roja vegotin û salixdanê, bi alîkariya bîr û xeyalan, wî li hev tîne û »çêdike.«Herwekî

ko tu niha wan li hev tînî û çdikî.

Ew roj û ew civîn niha baş tê bîra min. Lê gotinên bavê min baş nayên

bîra min. Hingî bala min, ji gotara bavê min zêdetir li ser awirê guhdaranbû. Min bêtir li tesîra gotara bavê xwe dinihêrî. Herkes li wir bû; Seyid Evdilqadir, Abdillâh Cewdet, mamên min, birayê min Kamu ran, Fuad û Hemdî Paşa, şukrî Babanzade û gelek kesên din ên bijarte yên civata kurdi. Di nav guhdaran de, gelek hevalên min ên pêşerojê, hevriyên min ên qedere jî hebûn; Dr. şukrî Mihemed, Memduh Selîm, Hemzeyê Mukisî, Mewlânzade Rifat... Hemû li wir rûniştibûn, bêyî ko haya wan ji bûyerên kambax ên rojên bê, mirin, sêdar û sirgûnê heb e...

Gotina te ye, di wan rojan de, »qayide û prensîbên Wîlson« ji devê kur-

dan nediketin. Bi dû şer re, serekê Dewletên Yekgirtî yê Amerîkayê Thomas Woodrow Wîlson, ji bo çareserkirina mesele û gelşên piştî şer prensîbine gelekî hêja û demokrat îlan kirin. Li gora wan prensîban, kurdjî dikarîbûn bibin xwedan der û dewlet. Ew prensîb, bi gotina bavê min, gelekî li rewşa kurdan dihatin. Loma jî

kurd, bi hemû hebûna xwe, li wan xwedî derdiketin û behsa wan dikirin.

Hingî rêber û pêşewayên cemiyetê kovarek jî, bi navê »Jîn« diweşandin.

Dostên min Memduh Selîm Beg û Hemze Begê Mukisî gerînendeyên ko - varê bûn. Mixabin, min wext nebû tê de binivîsa, lê birayê min ê biçk Kamo ko êdî jê re digotin Kamuran Beg, tê de, bi pênuşa xwe ya p ir delal, dinivisî. Hem Kamo hem jî biraderên din, di Jînê de, gelek bendên hêja ûbalkêş li ser Prensîbên Wîlson nivisîn. Benda Kamo niha ji wan rojan çtir tê bîra min. Hingî bala min baş ne lê bû, lê niha kitekit jî tîn bîra min. Rojekê, danê êvarê, li malê, li bexçê, ez li kêleka bîrê rûniştibûm, şehribana nazik û hertim alîgir ko min, mixabin, êdî mîna berê nikarîbû hertim bidî- ta, çayeke bi dem çkiribû û jê qedehek dabû min û min kitabek li ser wezîr-i azamên Osmanî ko bi destê sultanên Osmanî hatibûn kuştin, dixwend. Nivîskarê wê niha nayê bîra min, lê kitabê li ser mêjiyê kargeran-

106

dina Dewleta Osmanî gelek tiştên balkêş digotin. Sorahiya çayê, rengê ta- va danê êvarê û xwîna ko ji nav rûpelan diherikî, li hev dihatin. Lê benda

Kamo, yanê Kamuran Beg, ew aheng xira kir. Hingî ew bi heyecan ji hundir

hat û kaxizên destê xwe rêberî min kirin. »Müthîş bîr makale yazdim«, wî got. Min bi ken lê nihêrî. Wî nû simbêl berdabûn. Simbêlên wî yê zirav lêhatibûn. »Simbêl li te hatiye«, min jê re, bi ken, got. »Li vê bendê binihêre,

lê binihêre...« wî bi israr got. Min kitaba destê xwe danî ser masê û bi lez, li

benda Kamo nihêrî. Navê benda wî »Kürdistan İçin« bû. Wî di nivîsaraxwe de qala serbestî û azadiya kurdan dikir û li derekê jî, mîna niha tê bîra min, wî behsa hêjahiya 14 qayideyên Wîlson dikir. Wî bendek ji bejn û um- rê xwe mezintir nivîsibû. Bend bi zimanekî

xweş, li ser mijarekî balkêş û bi zanîneke kûr hatibû nivîsîn. Lê ji bo ko ez wî hêrs bikim, min jê re got; »Tu vê bendê bigire û bavê nav vê bîrê... ew ne tiş tekî ye...« Lê Kamo dûrbîn bû,

wî benda xwe navê bîrê, bêdeng, ew wergirt û çû. Benda wî di Jînê de weşiya.

Bavê min rast digot, huner ne gotina tiştên rast e. Huner ew e ko mirov

bikaribe tiştên rast çke jî. Prensîbên Wîlson ko ji devê kurdan nediketin, rast bûn, hêvî û hedef bûn. Lê kurdan nikarîbûn ew bi cîh bianiyana, ew ketin hev û li pey xelkên din man...

Emîn Alî Beg bi destê xwe yê rastê riya xwe mist dide, li guhdaran dini-

hêre. Tiştên ko ew bibêje, hê jî, pir in. Lê ew dil dike, hevalên wî jî bipeyivin û ew bi hev re li çareyan bigerin.

– Aziz Dostlar, ew dibêje, eger we îzin hebe, ez ê rûnim. Ez westiyam.

û ez dixwazim, hûn jî bîr û reyên xwe bibêjin.

Bêyî ko ew li hêviya bersiva wan bisekine, ew bi hêdîka li ser kursiye kêleka masê rûdine. Bedena wî ya giran û fireh kursî dadigire. Ew ji berî-

5

ka xwe ya hundir a çakêt destmalekê derdixe û pê eniya xwe pak dike.

Emîn Alî Beg destmalekê ji bêrika xwe ya hundir a çakêt derdixe û pê eniya xwe pak dike. Ew westiyaye. Di nav van çend salên dawîn ên dijwar û kesertijî de, ew ketiye û kal bûye. Tevî ko ew hê jî baş li

xwe dinihêre, dixwe, vedixwe û li xwe dike, ew gelekî qelew bûye, bede-

na wî gelekî giran bûye.

– Welê dixuye, kalîtî êdî zora min dibe, ew, bi ken, ji civatê re dibêje.

Em çawan bikin, halê dinyayê ye... Lê tirs min ew tirs e ko ez nikaribim

herim welatê bav û kalan û ez serbestî û azadiya axa bav û kalan nebîn-

107

im... çavvekirî, bi vê hesreta kambax, herim diyarê rehmetê...

Civat li ber van gotinan dikeve, ji kesî deng dernakeve. Ew, bêdeng, li

hev dinihêrin. Haya wan ji zehmetî û aloziyên li ber kurdan heye. Kurd

ne dewlet in, nebûne dewlet û tu dewlet jî, bi dil û can, xwe nade ber doza

kurdan. Yekîtiya wan nîn e, şîûra yekîti û yekbûnê dûrî wan e. Welatê wan ê westiyayî, ji ber pêlên şer, li ber lîngan çûye, bûye kavi û ji hev

ketiye. Lê tevî van, kesên vê civatê û rêberên din ê kurdan, her, dixebitin,

dilebitin û dilezînin da ko tiştê bi dest xin, şertên jiyaneke aza û hêja

bînin pê. Jiyaneke aza û hêja... lê çawan, çawan?..

Civat, mîna her carê, li mala Emîn Alî Beg geriyaye. Bedirxanî li salona

malê civiyane. Emîn Beg, birayên wî Ebdilrehman, Mihemed Elî, Mirad, Xelîl, xwişkên wî Nazlî, Adeviye, Edîbe, Belkis, herdu lawên wî Celadet û Kamuran hatine civînê. Bedirxanî, jin û mêrên wan ên tem-

sîlkar, heftê carekê li mala Emîn Beg, ji bo kar û şixulên malbatê, dicivin.

Malbata ko xwe mîrên kurdan û rêberên welatê kurdan dihesibîne, pir

fireh û mezin bûye, hejmar gihîştîye hezaran. Niha ew ne bi tenê li aliyê

Kadikoyê, lê li herdu milên Stembolê belav bûne. Barên malbatê pirtir, karên welêt girantir, nîrê bindestiyê diwartir, daxwaza azadiyê kûrtir bûye. Kurd xwe li navê Xwedê, li navê wan digirin û tên nik wan. Ew jî

xwe li prensîbên Wîlson digirin û geh derin nik niwênerên dewletên ser-

ketî geh nik karbidestên dewleta Osmanî ya bêquwet. Endamên mal- batê, nemaze endamên vê civatê her li civînan in. Rojên wan bi civîn,

hevûdudîtin, çyin, hatin, nivîsîn û peyivînê derbas dibin.

Emîn Beg, çavên wî li ser civatê, tiliyên herdu destên xwe derbasî hev

dike û destên xwe datîne ser zikê xwe û dibêje,

– Eger em kurd di vê geremolê de nikaribin xwe bi derekî bigihînin, hema ji niha ve, ez ji we re bibêjim, sibê dê dereng be, pir dereng be.

Navê wî niha nayê bîra min, lê nivîskarekî gotibû; armanc û hedefênmezînin û bilind, her gav li pey perdeyekê ne. Tu bîr bi wan dibî, tu wan xeyal dikî, tu dizanî ko ew hene. Tu ji bo wan jî dixebitî, her tiştî dikî. Lê belê, ew li pey perdê ne. Te ew nedîtine, tu wan nabînî û tu nizanî ka tu dê wan bibînî. Armanc û hedefên kurdan jî, hinekî, weha bûn. Kesî ew nedi - nasîn, nedîtibûn, nejiyabûn. Mîrê dawîn ê kurdan ko li ser axa xwe, hinekî, serbest jiyabû, bapîrê min Mîr Bedirxan bû. Ew jî di salên 1830-40-an de bû. Ji wan rojan û pê ve, kurd di bin perda bindestiyê de jiyabûn û armanc û hedefên wan li wî aliyê perdê mabûn. Ew kesên ko piştî şer, em jî tê de,

108

xwe bi armanc û hedefên pîroz girtibûn, hemû, zarokên bindestiyê, neviyên menfa û xerîbiyê bûn.

Em, ew kesên ko beşdarî wan civînan dibûn jî, zarokên xerîbiyê bûn.

Lê



digel her tiştî, me dil dikir xwe bigihanda vî aliyê din ê perdê. Ew civîn... ax ew civîn... min gelekî ji wan hez dikir. Tu ji wan re dibêjî »civîn.« Me ew bi »içtima« bi nav dikirin. Her hefte, her roja îniyê, içtima me hebû. Bavê minserekê içtimayê em jî aza bûn. Piraniya caran, min zabitên içtimayê dinivîsîn, carina jî Kamo, yan bavê min. Roja îniyê, bi gotina hingî badê ze- wal, yanê piştî nîvro, em li mala me diciviyan. İçtima saetek, du saetan de- wam dikir û li dora saet pêncê danê êvarê diqediya. Paşê jî xwarina êvarê û şiv bû. Diya min, şehriban, xwînga min, metên min, eger hebûna jinên mêvanan, wê rojê li mitbaxê bûn. Wê rojê bîhnên xweş ji mitbaxa me difûrîn, hemû Kiziltoprak bi bîhnên xweş ên xwarinên taybetî yê Botanê mest dibû. Rojekê bîhna kutilkê sefayîh, mêlaka qelandî, merge û savarê, rojê din jî bîhna kipe, serûpê, dîzik û birincê ji malê difûriya.

În roja bîhnvedanê bû, rojê mubarek û xweş bû. Bi xêra içtimayan, em

jî diciviyan ser hev. Rojek, du rojan berî içtimayê, şehriban, Mezo, Hîkmet, Safter bi hev re dadiketî bazarên Kadikoyê û haziriyên roja îne dîkin. Li malê hew zarok mabûn, em hemû mezin bûbûn û karên malê êdî bi destê şehribana delal û xweha me ya dengxweş dihate gerandin. Safter, Hîkmet û heta radeyekê jî Tewfîk alîkariya wan dikirin. Diya min jî, mîna bavê min, êdî ketibû, pîr bûbû. Kekê me Sureya li Misirê, Kahîrê, serekiya tevgera kur- dî dikir. Wî jî, ji wir, dixwest xwe bi wî aliyê din ê perdê bigihîne...

Gava dinya xweş bû, sifra mezin li bexçê, li kêleka bîrê, dihate raxistin, di

rojên sar de, li mitbaxê. Bi germahî û evîneke bêpayan em li ser sifrê rû - diniştin, piştî şivê jî, heta d erengê şevê, sohbetên germ, peregende, li sa- lon, mitbax û kitabxanê geş dibûn. Sohbetên min bêtir bi do tmama min Saadetê re bûn. Saadeta çavxezal, gerdendirêj û gelekî bedew û têgihîştî ko heta niha ne te ne jî min qal kirê, di nav malbatê de hevala min a herî nêzîk bû. Ew, bi umir, çend salan ji min mezintir bû û min jê re digot »abla.« Saadet Abula

dosta min, hevriya sirên jîna min bû. Gava me wext dibû, em, carina, bi hev re, derdiketin girên aamlica û sküdarê, nav dar û dehlan, gerê... Di rojên içtimayan de, ew jî, her dihat malê û alîkariya me dikir.

Em zarok û neviyên Mîr Bedirxan, di wan rojan de, li hember hev nerm û

kîbar, germ û ziravbihîstiyar bûn. Mîna ko me bîr bi rojên bê yê xedar biribû û me fahm kiribû ko malbata me, yekîtiya me, dê belav be, em ê ji hev bikevin û her yek bi derekî de herin. Ew rojên me, mîna germahiya

109

berî ba û bahozê bûn...

– Heke bi dilê we be, Kamuran, pênûs di destan de, dibêje, ez notayeke

din li ser mafên me Bedirxanpaşazadeyan û kurdan ji sefirên Amerîka,

Fransa, îtalya û Ingilîtanê re binivîsim?

– Erê, çima na, ma çi zirara me tê de heye? Evdirehman Beg dibêje. Lê

em nusxeyek ji notayê ji Sureya Beg, Misir îstîklâl Komîtesê re jî bişînin.

Ew, bi dengdanê, pêşniyara Kamuran dipejirînin. Kamuran vê biryarê

jî, bi destnivîsa xwe ya xweş, di deftera ber xwe de dinivîse. Ew hê biryarê

dinivîse, ji der, ber derî, dengê diya wî tê;

6

– Me sifre li bexçê raxistiye, kerem bikin.

– Me sifre li ber kon raxistiye, kerem bikin. Celadet, Kamuran, Ekrem Begê Cemîlpaşa, Ebdilrehîm Efendî, Yakup Paşa, Major

Noel û çend kesên din radibin û ber bi kon derin. Dinya hê ronî ye,

bi tenê yek-du stêrk li aliyê rojhilat, bi nermahî, diçrisin. Komik, Yakup Paşa li pêşî, yê din li pey wî, hêdî hêdî, ber bi konê reş dere. Celadet, Kamuran, Ekrem Begê Cemîlpaşa, Ebdilrehîm Efendî û Major Noel mêvanên Yakup Paşa ne. Yakup Paşa ko umrê wî li dora 30 -

35-an e û nû zewiciye, serekê eşîra Atmîyan e. Sifreyeke dirêj, li ser mehfûrên kurdî yê koçeran, li ber konekî reş ê kurdî hatiye raxistin.

Sifre têra xwe dirêj e. Bi qasî bîst kesî li dora sifrê li pê, li hêviya Yakup Paşa û mêvanên wî ne. Ew, bi giramî silav li wan dîkin. Yakup Paşa û mê-

vanên wî jî silavên wan werdigirin û li wan vedigerînin.

– Kerem kin ser sifra koçer û eşîran, Yakup Paşa, bi kurdiya xwe ya ze-

lal, dibêje û cîh nîşanî mêvanên xwe dide.

Mêvan, li kêleka hev, li ser kulav û doşekan rûdinin. Piştî mêvanan, Yakup Paşa û yê din jî li dora sifrê rûdinin. Kesên ko li ser sifrê rûniştine, ji sîhî zêdetir in. Ji sifrê bîhna go şt û savarê difûre. Li navend û her- du aliyên sifrê, sê sîniyên mezin û fireh hene. Sinî heta dêv b i savarê tijî ne û li ser savarê jî berxên birajtî hene. Di navbera sîniyan de, bi qasî heft -

heyşt beroşên fireh, bi xwarin û şîvên cihê, hene. Di nav çend tawan de

qelî, di nav çend tebaxên fireh de jî sewze û salate hene. Li ber her mêvanî

jî tabexeke vala heye. Piştî rûniştina hemû mêvanan, çend kes radihêjin xizmetê. Yek goştê berxan lîme dike û li mêvanan belav dike, yekî din savarê belav dike, yek dew dixê tasên mêvanan, yekî din jî kêmaniyên sifrê temam dike.

110

– Eger kêmaniyên me hebin, li me megirin, Yakup Paşa dibêje, ev sifre

ne hêjayî mêvanên mîna we ezîz e, gelekî bi lez bû.

– Min sifreyeke weha zengîn, rengîn û xweş li tu derî nedîtiye, Major Noel, bi kurdî, dibêje û tîka goştê destê xwe dibe devê xwe. Ev sifre bi

rastî sifra kurdî ye, ev mêvanperwerî, bi rastî, ew mêvanperwerî ye ko

min her dibihîst...

Ji sifrê hinekî bi dûr agirekî gur vêketiye û çend kes bi êzingan agir geş

dikin. Ji agir hinekî dûr jî bîrek heye. aend jin bi dewlê avê jê dikişînin. Koçerên eşîra Atmikan, zarok, jin, mêr, pîr û kal, li dor û navbera konan

derin û tînan. Eşîra Atmikan, mîna her salê, îsal jî derketine zozanan. Ew zivistanan li deştê, havînan jî li zozanan in. Ew havînan tînan û konên xwe li dora vê bîrê vedigirin. Major Noel û hevalên wî, li ser rîya xwe, îşev, bûne mêvanên wan. Kurdan hatina wan bihîstiye û dixwazin wan bibînin, bi wan re bipeyivin û bizanibin ka çi dê bi serê kurdan de were.

Yakup Paşa ko nû jî zewiciye, çi ji destan tê, teksîr nake da ko kêfxweşî û

mêvanperweriya xwe nîşan bide.

Ne bi tenê Yakup Paşa, em jî kêfxweş bûn. Ji kêfa me re payan nînan bû. Em li welatê bav û kalan, li ser axa kurdan bûn. Ew kurdên ko me li Stembolê, ewçend behs dikirin, li wir, li nik me, li ber çavên me bûn. Ew gera me ya Kurdistanê, bi serê xwe, bûyereke girîng a jîna min e. Tu bawer bike, heke min keys, wext û îmkan hebûna, min ê li ser wê gerê romanek binivîsa. Wê gerê ez nêzîkî welatê min kirim. Wê gerê ez ji welatê min bi dûr xistim. Belê, ev herdu jî bûn. Wê havîne, havîna rengîn a 1919-an, mohra xwe li jî- na min xist, heta bi heta...

Bi dû xebat, daxwaz û tevgera fireh a neteweyî ya kurdan re ko ji Kürd

Tealî Cemiyetî heta hemalên Stembolê, ji beg û tucarên Diyarbekirê heta gundiyan Botanê, ji elewiyên Dêrsimê heta soranên Suleymaniyê, bi awayek î peregende, tê de bûn, Ingilistan û hevalbêndên wan, hatibûn ser rîya fikra mafên kurdan û êdî behsa war û welatekî ji bo kurdan dikirin. Ji bo wê fikrê wan dixwest heyetek, bi serokatiya Major E. M. Noel, ko bi kurtî me jê re digot, »mecir Nowil«, bişandina welêt. Piştî ko ew bi Kürd Tealî Cemiyelî û bavê min re peyivîn, me biryar da ko ji kurdên Stembolê ez û Kamuran, ji Diyarbekirê jî Ekrem Begê Cemîlpaşa di heyetê de bin. Ez û Kamuran ji Stembolê ketin rê û 23'ê tîrmehê em gihîştin Helebê. Major Noel ko bi herd u zaravayên kurdî, kurdiya jor û jêr, baş dizanîbû û serê xwe gelekî bi doza kurdî diêşand, li wir, li otêlê, tevî kaxiz, pênuş û makîna

111

xwe ya fotografê, li hêviya me bû. »Hûn bi xêr hatin«, wî bi kurdiyeke têgi- hîştî got. »Vous êtês oussi bienvenu«, min jî, bi fransizî jê re got. Ingilîziya min û Kamuran ne e wçend baş bû, loma me dil kir, em pê re bi fransizî

bipeyivin. Lê wî dil hebû bi kurdî bipeyiviya. »Ji bo min weha hîn çak e«, wî got. Piştî ko Ekrem Beg jî hat, em ji Helebê, ber bi aliyê welatê bav û kalan, ketin rê. Ez ê niha çawan behsa wan rojan bikim?.. Ez û Kamuran gelekî bi heyecan bûn. Coş û kela me, meraq û daxwaza dîtin û zanîna me bê payan bû.

Em ketibûn nav kurdan... heta 20'ê îlona 1919-an em di nav wan de man. Me axa û beg, peya û siwar, eşîr û koçer, deşt û zozan, bajar û gund, newal û gelî, dar û dehl, çem û çiyayên kurdan dîtin. Em di bin esmana ronî û bi silavên stêrk û heyva ronî ya welatê kurdan de razan. Di berbangên çkesor ên zozanan de, me xwirîniya xwe, bi xizmeta pîrejînporspî û bêrîvanên xama, bi şîr, firo, to, mast, mastê kilanê, nivîşk, penêr, penêrê ter, helandî, sîrikê û pûngê kir. Tevî siwar û çekdarên eşîrên kur- dan, em di dehl, newal û bihurana re derbas bûn û hilkişiyana çiya û zozanên serî li esmanan. Me bîhna

xwe bi hawa paqij veda, rûyê xwe bi ava kah - niyên sar şuşt, kiras û goreyên xwe li ber devê çem û lehiyên zelal şuştin. Li ser hesp û mehînen kumêt, qemer û şînboz, geh bi rewan û loq, geh bi gurloq û çargavî, me xwe ji tixûbên eşîrekê gîhand tixûbên eşîreke din. Li ber konên reş ên bi mû risandî û li ser donzdeh sitûn û singan vedayî, em rûniştin û me li bergehên hêşîn û zer ên warên kurdan temaşe kir. Heta ber destê sibê, li ber agirên gur, me li dengbêj û stranbêjên navdar ên ko rêzên stranên mîna zêr, zîwer û lûlû li pey hev rêz dikirin, guhdarî kirin. Em bi dengên mirîşk û dîk, salûr û bîlîl, teyr û kew, seg û tajî, mehîn û cah- niyan hişyar bûn. Li Malatyayê ko mamê me Xelîl Ramî Beg li wir mutesarîf bû, me, li mal û koşkên kurdan, axayên simbêlbadayî, şêxên rîdirêj û seyidên simbêlpalik dîtin. Zabit û eskerên tirk, bi çek û pûsat, li quntarên çiya û zinaran kemîn û dahfik danîn, derketin ser rîya me, xwestin me, ne- maze min û birayê min, bigirin, bikujin. Me rêwîtiyeke bi qasî du mehan, bi bîhn, hilm û tahma welatê kurdan, bi alozî û diwariyên welatê asê ko her roj, her deqe, li dora me bû, anî pê. Me hem dostî û mêvanperweriya bê- payan a kurdan dît, hem jî îxaneta wan a navdar... Paşê em, dîsan, veg- eriyên Helebê û ji wir jî Stembolê...

Di rêwîtiya me de, me her çaran jî defter hebûn, mîna şagirtên mektebê,

me çî bidîta dinivisî. Min û Major Noel bi kurdî, Kamuran û Ekrem Beg bitirkî dinivisî. Belê, wî jî bi kurdî û ji min jî çêtir dinivisî. Ji deftera min,

112

Kamuran û Ekrem Beg tu şop li pey neman, ew li derin, mîna gelek tiştên me yên din, wînda bûn û çûn. (Bi tenê min, di salên 30-an de, li derekê, bi hênceta tiştêkî din, bi çend rêzan, di ser re, behsa wê gerê kir...) Lê Major Noel, dostê me, notên xwe yên gerê, bi dû re, sala 1922-an, li Basrayê, mî- na kitab, bi inglîzî, weşand. Wî di kitaba xwe de behsa malbata me, bavê min, ma mên min, min û Kamuran jî dikir. Li ser min, wî weha dinivisî; »as- sistant editor of

newspaper Serbestî at Constantinople...« û weha, li gorabîr û reya xwe, didomand; »He suffers from the inevitable effects of long residence and training in Constantinople, but he has the making of a good man.« Wî gunehê xwe bi min dianî, lê bawer bû ko ez li ser riyeke rast û baş bûm. Ez ê bibûma mirovekî rind û baş. Hîsên min, pêwendiyên min ên piralî û rengîn, welatê min ê xewn û xeyalî, bajarê min ê ko ez tê de di- jiyam... van bala wî nedikişandin. Wî li ser Kamuran jî weha digot; »Barrister at Constantinople. Knows no Kurmanji. Sensible quiet individual - has not so far come to the fore...« Ew bi Kamuran gelekî bawer bû, lê gava wî digot ko Kamuran bi kurdî nizane, ew ne rast bû. Kamuran bi kurdî dizanîbû, lê ne ewçend baş û xweş. Loma jî Kamuran, ji bo axaftinê, tirkî tercîh dikir. Lê paşê, Kamuran bû yek ji pisporên herî mezin ên kurdî û şîr, bend, nivîsar û kitabên hêja û nemir bi kurdî nivisîn. Rêwîtiya me, gereke geş û balkêş ji xewn û xeyalan bû... Piştî xwarinê, sifre bi lez ji erdê radibe, doşek û bahlîfên nû, dîsan li ber kon, tîraxistin û pêşiya kon ko mîna meydana biçûk e, vedibe. Niha wexta dîlan û govendê ye, dîlana êvarên ronî û govenda kurdî. Major Noel û Kamuran li milekî, Celadet, Ekrem Begê Cemîlpaşa û Evdîrehîm Efendî li milekî Yakup Paşa rûniştine. Yakup Paşa, simbêlbadayî, rûgeş, ji rewşê razî, milekî wî li ser bahlîfan, dest dike da ko govend bê gerandin. Pêşî def û zirne tê. Bi qasî bîskekê, def û zirne lêdikevin, bi dû re

komeke govendkêşan, jin û mêr, di milên hev de, bi dîlan û stran, ji pey agirê gur, hêdî hêdî, tên ber kon, kêleka bîrê û bi aheng xwe dilivînin û

dilîzin. Govend û stran pêşî nerm û giran in, lê pey di pey, ew geştir û pi-

hêttir dibin. Mêr û jin ên govendkêş ko hemû jî xort û ciwan in, di nav

cil û bergên xwe yê taybetî yê koçeran de, mîna ko bi firê ketibin, mil

bi mil, li dora bîrê govendê nedîtî û bêpayan digerin. Bîr dibe navend, ro û govenkêş dibin stêrk, heyv û li dora wê çerx dibin, her çerx

dibin.

– My God, my God, Major Noel dibêje, ez divê resmê vê bergeha ecêb

113

û nedîtî bikişînim. Eger we icaze hebe?

– Ma ew jî gotin bû? Yakup Paşa dibêje, icaze ya te ye, kerem bike.

– Na, te dît... jin û keç jî hene... ka heye ko hûn eciz bin. – Na bavê min! Jinên me ne mîna jinên xelkê ne, tu resimên xwe bik-  
işîne...

Major Noel flaşa xwe ya nû bi makîne ve dike, radibe ser piyan, ber bi

bîrê dere û dest bi kişandina fotografan dike.

114

FOTOGRAF 7: »Derketî; terka welatê xwe da û kete dinyayê xwedê rêberiya derketiyan bike!..«

1

Fotografê heftan a romana Bîra Qederê, meriv dikare bibêje, fo- tografa keserê ye. Yan jî, eger meriv bixwaze hinekî dûrbîn be û bikaribe xwe bigihîne »pey« fotografê, meriv dikare bibêje; fo-

tografa heftemîn a destpêka riya kambax a keserê ye.



Fotografa ko hinekî tarî ye û nîşana tarîtiyê ye, welê bi keser dixuye. Keser hatiye û ev wêna ko di kurte-demeke jiyânê de ew kurtedemakambax kiriye nemir û bi dû re jî ew kurte-dem kiriye fotografa vê ro-

manê, bi her awayî, vegirtiye...

Keser, stirîhên jiyânê, stirîhên ko dora gulê rapêane, hatiye û dora vê

wênê rapêçaye...

Li ser kaxizê riziyaî yê nemir lehengê vê romanê, yan jî kesê ko bûye

sebeba afirîna vê ro manê, Celad et Alî Bed irxan dixuye. Di nav reşahiyeke tenik de, bi tenê ew dixuye. Wî destê xwe yê rastê daniye ber pencereyeke

trênêkê û li der dinihêre. Di nav kompartimaneke tirêneke bênav û bênişan de, ew, hinekî stûxwar, li cîhana derve ko pencera trêne ew jê ve- qetandiye, dinihêre. Foto ji aliyê kêlekê hatiye kişandin.

Loma jî bi tenê aliyekî Celadet dixuyê. Kompartiman hinekî tarî ye, eger meriv kesê nex- uyayî yê ko ev foto kişandiye nehesibîne, ji Celadet pê ve tu kesê din nax - uyê. Aliyê din ê pencerê yê derve ronî ye. Reş û spî li kêleka hev in, bi tenê

pencere wan ji hevûdu vediqetîne. Meriv dikare, bi zimanekî basîd, we- ha bibêje; ji çara sisiyê vê wênê tarî ye, ji çara yek jî ronî.

Trên ber bi ko de dere? Ew li ko ye, çawan e, cîh û warên ko Celadet bi

kûrahî lê dinihêre, çi dever in? Di wênê de, ev ne diyar in, jê fahm nabe.

Lê reşahî û hinekî jî ronahiyê wêne vegirtine.

Rûyê Celadet ê xort bi xem û keser e. Xem û kesera li ser rû baş dixuyê.

Di wênê de bi tenê çavekî dixuyê. Ji aliyê din ê rû bi tenê birû û bijangên

çavê din dixuyin. Lê belê, tevî ko herdu çav, bi hev re, baş, naxuyin, navenda fotoyê çav e. Di navbera hemû fotografên Celadet de, heye ko

115

ev fotografa yekemîn be ko tê de çav û nerîna Celadet evçend kûr û

manîdar e. Celadet li ko dinihêre? Bi îhtimaleke pir mezin, bêyî ko haya wî jê hebe, ev fotograf tê kişandin. Bi gotina îlmê fotografê, ew bê hazirî

tê girtin. Ew, sade, rehet, rûniştiye, milê xwe yê rastê daniye ber devê

pencerê û li der, bi hemû kûrahiya nerînê, li dûr dinihêre. Belê, ew pir li dûr dinihêre, lê nerîna wî ne nerîneke diyar, misoger û têkûz e. Ji b erva- jiyê, nerîna wî nerîneke vala ye. Ew kûr li dûr dinihêre, lê heşê wî li dereke din e. çavên wî li ser roniya derve ye, lê heşê wî li ser pejn û hîsên ko di hundirê wî de pêl didin e. çav li der dinihêre, lê ew li dinya hundirê xwe

difikire. Trên dere, yan jî ew ê here. Trên ê wî û rûpelên romana Bîra

Qederê ber bi ko de bibe? Heta kengê, çawan? Ev çyin ê kîjan riyên nû li ber wî veke? Ma her çyinekê vegerekê jî navê? Hingê vegeer kengê ye?

çawan û di kîjan şert û mercan de? Ya jiyana ko li pey dimîne? Kes û

nasên ko li pey vê çyinê dest hildidin? Ew ê wan, dîsan, kengê bibîne? Ji

nerîna çav baş dixuye ko Celadet di nav hîsên weha de ye.

çav nerm û aram, melûl û zîz e. çav nîvçe vekirî ye, heye ko ew giriyaye, yan jî kelgirî bûye, yan jî bi pêlên hîsan sermest bûye... Kî dizane? Eniya fireh û poz, ew pozê ko dapîra Bedirxaniyan Rûşen Xanimê mîna »pozê beranan« bi nav dikir, nerîna kesertijî ya çav tamam

dikin. Pêşiya eniya fireh û dirêj, hinekî, dibiriqe. Heye ko tîrêjeke ron- ahiya derve xwe gîhandiyê û bi germî wê radimûse. Porê ko bi qasî sê

tiliyan dirêj e û ber bi paş, bi hostehî û bi huner, hatiye 9 99ehkirin jî, mîna enî, hinekî dibiriqe. Lê ronahî xwe bi cênîkê ko zêde ne dirêj e, nagihîne. Cênîk, hinarik û guhê mezin û dirêj perçeyên aliyê tarî yê wênê ne. Gelo danê sibê ye, yan danê êvarê ye? Tava wê kurte-demê li ko ye, li esman-

an, li pey asoyan û li ber avaçûnê, li ku?..

Herç pozê dirêj e li rûyê dirêj tê. Poz, mîna nikulê teyrê eylo, ber bi jêr

dibe. Simbêl her mîna xwe ye, qemerî, kin û kurt. Devê dirêj girtî ye, lêvên qelaw li ser hev in.

Stûyê îşligê girtiye û qirawateke zirav û reş pê ve ye. Xêzên zirav û dirêj

ên reş ên li ser îşligên spî moda salên 20-an nîşan dide. Ev celeb îşlig, îşligên stûkurt û xêzdirêj mensûbiyeta xwediyan ba ş nîşan dide; ron- akbîr, nivîskar, rojnamevan, arîstokrat, siyasetger...

Ev hemû tişt û hîn tiştên din di nav vê wênê de dixuyin. Lê gelek tiştên

din jî hene ko di vê wênê de ne, lê veşartî, ne xuyayî. Herwekî ko hatiye

gotin, fotograf bi herdu milên xwe, milê xuyayî û yê nexuyayî, hêja ye.

Gava aliyê veşartî li aliyê xuyayî zêde be, yan jî pê tamam be, hingê ew fo-

116

tograf dibe balkêş û hingê ew dest bi peyivînê dike.

Di vê fotografê heftemîn a Bîr a Qederê de ko rûpelên nû li romanê zêde dike û wê ber bi derine nû dibe, şopên salên xem û keserê hene. Sal,

salên 20-an in, salên piştî şer, salên tevlihevî, hilweşîn û ketinê, salên kul

û derdan, şik û gumanan, rê û rêwîtiyê...

çav li der, li cîh û warên ko li pey dimînin, dinihêrin. Rêwîtiyê dest pê

2

kiriye, wext, wexta veqetînê ye.

Rêwîtiyê dest pê kiriye, wext wexta veqetînê ye. Roja nû ya çarşemiya îlona 1922-an hê nû dest pê kiriye. Dinya zelal û çiksayî ye. Kiziltoprak hê baş hişyar nebûye. Dengên çivîkên darên bexçê

Emîn Alî Beg alîkarî li hişyarbûna Kiziltoprakê dîkin. Ji dûr ve dengên çnd dîkan û paytonan tên. Darên bexçê mala Emîn Alî Beg hê pelên xwe neweşandine, daran, neynika dewr û dewranan, dem û demsalan, hê

kirasê xwe yê bihar û havînê ji xwe nekirine. Wan, bi hemû rengînî û be- dewiya xwe ya payizê, dora kesên ko li bexç, li kêleka bîrê rawestane, gir- tine.

Di vê destê sibê de, hemû mal, Emîn Alî Beg, Samîha Xanim, şehrîban, Celadet, Kamuran, Hîkmet derketine bexçê. Mamê Celadet, Murat Beg, metên wî Adeviye û Edîbe Xanim û dotmamên wî Saadet

Abla û Perîxan ko wê şevê li nik wan, li malê razane, tevî wan derketine

bexçê. Wexta rêwîtiya Celadet û Kamuran hatiye, ew ê, îro, êdî bi mis-

ogerî, herin, ber bi deverên dûr pir dûr. Niha wexta xatirxwestin û hevû -

du hembêzkerinê ye, wexta dua û mirazan e. Lawên malê, Celadet, Kamuran û Hîkmet rûgeş û bi ken in, yan jî ew dixwazin welê xwe nîşan bidin. Yê din bêdeng û zîz in. Hemû li nik hev, li kêleka bîrê, li pê rawestane û rûyê xwe ber bi rojhilat kirine, ber bi tîrêjên qels ên tavê ko hê nû li wan hiltên û bi zehmetî, xwe di nav çiqil û pelên daran re diseridînin...

Rûyê wan ber bi ronahiya tîrêjan, çavê wan li ser çavika makîna fotografê ye. Wan, ji bo roja rêwîtiyê, daxwaz ji studyoya Mr. Xendamankirine ko ew werin û roja veqetînê, lê beriya wê, endamên malê, bi hev re, li ser kaxizên fotografê, bikin nemir. ai dibe, çi nabe, çyin heye, heye ko veger nebe... Ji studyoyê şagirtekî jîr, tevî makîne hatiye û ew, mîna eskeran, li kêleka hev rêz kirine û dest bi karê xwe yê îspat, nîşandan û nemiriyê kiriye.

– Hîkmet Bey, bîraz daha îçeriye do

õru kayabîlîr mîsînîz? şagirt, serê

wî di nav cawê reş ê makîne de, dibêje. Biraz daha, biraz daha...

117

Hîkmet hinekî din jî xwe nêzîkî komê dike. Hemû li makîne dinihêrin. Emîn Alî Beg her du lawên xwe, Celadet û Kamuran, dane her du

aliyên xwe. Li kêleka Celadet jî diya wî ya kin, bi poşeyeke reş sergirtî, rawestayê. Li kêleka Samîha Xanimê jî du jinên din ko di jiyana Celadet de xwedî şop in, şehrîban û Saadet, rawestane. Li kêleka birayê Celadet, Kamuran jî xwişka biçk a Saadetê, Pêrixan ko bi bedewiya xwe nav daye û Kamuran, di danên êvarê yên yekta yên perên ava Kiziltoprakê de, jê re

rêzên li ser Baxê îrem ên Omer Xeyyam dixwendin, rawestayê.

Li kêlekên wan jî yên mayî yên malbata fireh a Bedirxanpaşazade ko êdî ji

hev belav dibe, rawestane.

– Dîkkat, çekiyorum! Fotograf tê kişandin. Careke din, lê îcar, hinekî din têkeltir, ew pişt

xwe didin devê bîrê û li kêleka hev rêz dibin. Fotografêke din jî tê kişandin. êdî wext tê, Celadet û Kamuran, li pey hev, derin destê bavê xwe. Emîn Alî Beg wan, yek bi yek, pihêt, bi qasî kêliyekê, hembêz dike

û bêdeng, bêyî ko tiştêkî bibêje, ji eniya wan radimûse. Paşê ew derin

destê diya xwe. Samîha Xanim hew dikare xwe rabigire, tevî çend dilopên

hêstirên ko ji çavên wê ber bi jêr dibin, ew wan demekê hembêz dike.

– Bila Xwedê bi we re be, kurên min, bila oxira we ya xêrê be, X wedê

mezin e, ew bi dengê pir hêdî û zîz dibêje û hedîsin dixwîne, mala we vekirî û zimanê we şêrîn be...

Celadet û Kamuran yê din jî, yek bi yek, hembêz dikin û ji wan xatir dixwazin. Paşê ew her du û Murat Beg û Hîkmet, bêdeng, bi hêdîka radi-

hêjin walîzên ko li ber deriyê malê ne û bi hev re, ber bi paytona ko li kolana biçk li hêviya wan e, derin. Yê din li kêleka bîrê disekin û li wan dinihêrin. Celadet û Kamuran jî dane rê û derin... Berî ko ew ji de-

riyê mezin derkevin û xwe bi paytonê bigihînin, ew careke din vedigerin

û li yê mayî dest dikin.

– Bi xatirê we, Kamuran dibêje, bi xatirê we, gava em gihîştin cîh, bi leza birûskê, em ê haya we pê bigihînin. Em ê hertim binivîsin... em ê di

demeke pir kin de, dîsan bigihên hev...

Hay Kamuran, birayê min ê ziravbihîstiyar, birayê min ê romantîk... Em diçn, ji Stembola ko min ê hew terk bikira, derdiketin, dibûn derketî, me rûyê xwe dabû ber bi dever û welatên nediyar û nenas û diçûn. Me dizanîbû; heye ko çyin hêsan bûya, lê vegera wê çyinê dê zehmet bûya. Lê em diçn, ji bêgaviyê û bêçaretiyê. Li ber me du rê hebûn; riya mirinê û

118

riya derketinê. Kîjan ji van çê bû? Bêguman ne yek jî. Yek ji yekê kirêtir bû. Lê me diviya ji her du riyên kirêt ya kê mkirêt hilbijarta. Dinya hê jî aloz bû, ba û bahozên xedar ên piştî şer, hê jî, bi gumegum, li dar bûn. Lê li welatê Osmanî û li payitextê wî welatê

hilweşiyayî tişteki êdî bi zelaî diyar bû; Mistafa Kemal û hevalbendên wî bi ser ketibûn, dewleteke nû, li ser kav-ilên dewleta Osmanî, gav bi gav ava dibû. Tişteki din jî êdî diyar bû; kirasê vê dewleta nû li me nedihat, tê de cîhê me nîn bû. Gazî Mistefa Kemal ew gera me ya welêt di devê xwe de kiribû benîşt û her qal dikirê. Wî her, bi neyînî, behsa gera me, me, bavê me û Major Noel dikir û li pey me bû. Te vgera kurdî ko me ewçend jê hêvî hebû, mîna her carê, îcar jî, ji ber se- bebên her carê, bêkesî, bêpiştî, nezanî û dijîtî û berberiyên navxwe, bi derekî negihabû, -tevî ko hê tevge r xurt û xîret qaîm bû... Lê hevalbendên Gazî Mistefa Kemal Stembol jî gav bi gav vedigirtin û cîh, bi her awayî, li me teng dikirin. Wekî din rê nemabû; me diviya terkî Stembol bikira. Pêşî em, bi dû me re jî bavê min ê kokim û diya min a pîr. Lê ber bi ku? Ber bi kekê me Sureya ko li Kahîrê serekiya gerandina karên tevgera kurdî dikir? Ber bi mamêm me yên ko li axa germ a Lubnan û Sûriyê rûniştî bûn? Ber bi birayên me Safer û Tewfîk ko ji bo xwendinê çûbûn welatê rojava , Munîxa navdar a navenda çanda rojava? Ber bi ku? Lê dawiyê, em gihîştin biryarekê, bi qewlê birayên me yên Behdînî bir- yareke miso ger; wê roja zer û sahî ya îlonê me dabû ser riya welatê rojava û em diçûn... Piştî nîvro yê, hema bi qasî kêliyekê bi dû nîvro re, keştiya bulgarî Serivia ji lengergeha Stembolê lenger hildide û bi giranî, ber bi Zerya Reş, bi rê dikeve. Keştî, çend caran, bi dengekî tîz ji Stembolê xatir dixwaze. Ava Bospore-yê li pêşiya keştî vedibe, bayekî sivik piştî pêlên zelal û spî yên avê ko keştî li pey xwe dihêle, mist dide. Ba bi hêdîka porê Celadet û

Kamuran ko li keştiyê, li aliyê pêşiyê, li ser p ozê wê rawestane û bi bal û dîqet, bi hîsên pir têkel, li herdu kiraxên Bospore-yê dinihêrin, li ba dike.

Minare, keleh, birc, qesr, qonax, saray, dar û daristanên nas, li her du aliyan, mîna ko ew rabûbin govendê, li ber wan, yek bi yek, xwe diyar dikin û winda dibin. Stembola ko ew di hembêza xwe de gir kirin, hewandin, perwerde kirin, mana jiyan û umrê wan da, sirên wan veşartin, bi dewlemendiyên xwe evîn û eşqên wan rengandin, bi şevên

xwe yên spî xewn û xeyalên wan neqîşandin, niha, li ber wan rabûye dîlanû dansa veqetîne. Celadet û Kamuran derin, Stembolê, bajarê xwe û um-

119

rê xwe, bajarê bi bîranînên ebedî tijî, bajarê keysarê bajaran li pey xwe di-

hêlin û derin.

– Kamuran, baş li Stembola nazdar binihêre, heye ko em careke din wê

nebînin, Celadet dibêje...

– çawan em ê wê nebînin? Umrê min, bihîst û heft salên min, li vî ba-

jarê derbas bûn. çawan em ê vî bajarê ko em, digel her tiştî, her lê veg-

eriyane, careke din nebînin?

3

«Wiyana... umrê min, bajarê qedera min... çawan ez ê te, careke din, nebînim?..»

Kamuran ji rojnama li pêşiya xwe, Neue Freie Presse, bi alemanî, şîîreke şaîrekî nenas dixwîne.

- Nasîna me û zimanê alemanî dê xurt be, Kamuran, rûpelên rojnamê

di destan de vekirî, ji Celadet re dibêje, em ê dakevin kûrahiyên alemanî,



dilê wî...

Celadet û Kamuranê ko ber bi dilê welatê rojava derketine rêwîtiyeke

dirêj, niha xwe gîhandine Wiyanayê. Ew li Café Continentale ya ren gîn û neyniktijî rûniştine û li hêviya şîva êvarê ne. Herduyan jî ne xwarineke aleman, lê x warineke nas, »Café du Paris« helbijartine. Lê şaraba sor ko ew bi hez hêdî hêdî vedixwin, otrîşî ye. êvar daketiye, jiyana germ a şeva sar a Wiyanayê hê nû dest pê kiriye. Salon hêdî hêdî tijî dibe. Otrîşî, kom

bi kom, jin û mêr, di nav kincên xwe yên ewrûpî de, tîn û maseyên sa -

lonê vedigirin. Pir vekirî dixuye ko ew hatine cîhaneke nû, medeniyeteke cihê. Ev cîhana Wiyanayê ji ya Stembolê û welatê osmaniyan, bi her tiştê

xwe, pir cihê ye. Paqijiya bajêr, dûzan û rêkûpêkiya jiyana rojane, aramiya civatê, lixwekirina şênîyan, aheng, neqîş û lihevhatina avahiyan û hejmarê pir a rojname, kovar û we şanan gelekî bala wan dikişîne. Lê

bêtir jî jinên Wiyanayê. Ew jinên Wiyanayê, bi bejna dirêj, por û guliyên

dirêj, kirasên teng, fîstanên dirêj û fireh û bi kena periyên û bîhnên buhiştî, ne bi tenê bala wan dikişînin, heşê wan jî bi firê dixînin. Ew jinên

ko bi kena periyên dibin periyên bê perwaz, niha, bi gavên nazenîn, tîn, li maseyên dora wan rûdin û germahiyeke bêpayan û bîhnên xweş ko Celadet û Kamuran baş nenasin, direşînin salonê.

Piştî du saet û nivê, saet deh û nivê êvarê, ew ê bi trêna êvarê, dîsan, bi

rê kevin û herin. Herdu jî westiyayî ne. Hemû roj, ew li pê, gav bi gav, li

120

kolan û kuçeyên Wiyanayê geriyane, bajarê nû keşf kirine. Ew di berban-

ga sibê de daketine Wiyanayê.

Belê, em li ber destê sibê, saet 7.15, gihîştin Wiyanayê. Saet 10.30-an trênek hebû. Lê em bi wê trêne neçûn. Em hatibûn Wiyanayê, bajarê du hezar salan, bajarê medeniyet û musîkê. Hê di dewr û dewrana Roman de, gava wan ev bajar ava kiribûn, navê wî lê kiribûn; Cortigiano. Yanê mîsala zerafet û kîbariyê. Em hatibûn bajarê mîsalên xweş ko em li pey bûn. Bêguman e ko me nikaribû vî bajarî, weha, bêyî ko bibînin, terk bikira. Me biryar da ko em dakevin bajêr û bi trêna êvarê rêwîtiya xwe bidomînin.

Tevî ko bayê şerekî kambax ew hejandibû, Wiyana hê jî ji bedewî û spe-

hîtiya xwe tu tişt winda nekiribû. Ew gotinên te yê nê jor ko te li ser Wiyanayê gotin, mîna gotinên kitêbokên rêwiyan in ko hingî digera me ya bajêr de, di destê me de bûn jî. Her çawan ko gotinên weha nikarin ruhê bajarekî salix bidin, ew têrî taswîra ruhê bajarê Wiyanayê jî nakin. Wiyana ko me ava wê vexwar û nanê wê xwar, bajarekî yekta ye çandêbû. Bi qewlê fransîzan, ew bajarekî »civile« bû. Mîna Stembolê, ew heta dev tijî esker, cendirme û zabit nebû. Bîhna musîk, huner, çand û edebiyatê jê difûriya. Avahiyên bajêr ên kevnare ko digel hezar salên ko bihurîbûn, hê jî bi asalet bilind dibûn, kelehên qaîm ên huner û musîkê bûn. Musîkjenên mezin Gluck, Haynd, Mozart, Beethoven, Schubert, Brahms û Strauss ko me dê bi dûre pir lê guhdarî bikirana, ji wî bajarî ronahiya musîkeke nû bi dinyayê gîhandibûn. Li wî bajarî ruh, hîs, deng û pejnên çand û milletên cihê, mil bi mil, bi hev re, piyase dikirin. Di wî bajarî de zêde rê nîn bûn ko meriv bikaribiya ji bo jîna xwe, şixul û meslekê hilbijarta. Meriv li wir, bêgav, mecbûr bû bibe musîkjen û musîkşînas, nivîskar û nivîsevan, evîndar û evînzez...

Em, ez, Kamuran û fransîzekî jêhatî yê bajarê Wiyanayê, ko me bi tesadufî li Wiyanayê nasî, bi hev re, çûn qonaxa Lichnowsky ko Beethoven tê de eserên xwe yê yekta îcra kiribûn, me Saraya Mezin ko mazûbanî li Napoleon kiribû, ziyaret kir, me avahiya

Esterhaziler ko hê jî jê dengênmusîka Haynd d ihat, dît, me tiyatroya Burgê ko hertim tê de klasîkên medeniyeta roava dilîstin, dît. Em çn taxên derveyî bajêr ko ordiyên os - maniyên heta wê derê hatibûn û mecb ûrî jê vegeyabûn. Me donzdeh saetên jibîrnebûyî, li wî bajarê Ewrûpa Navîn bihurandin. û gava em bi trê- na êvarê ji bajêr derketin, min ji bo bajêr, bi tirkî, weha nivîsî; Viyana cid - den muazam ve muhteşem bir şehir...

121

Min ev rêz li ko nivîsîn? Te behs nekirê, lê ji bo ahenga reng û neqşên

rûpelên Bîra Qederê, ez behs bikim. Berî derketina me bi çend rojan, roja ko min û Cananê êdî ji hev xatir dixwest, li Stembolê, Kadik oyê, Cananê, yara şevên dirêj û xewnên rengîn, kelgirî, deftereke biçk yadîgarî min kir. Defterek ko min êdî bi hêsaniî têdixist berîka çaketê xwe û gava pejnên fikrekê di serê min de diçn û dihatin yan jî pêlên hîsekê li ser dilê min radibûn, yan jî bayê germ ê hesretê li min dihate xezebê, bi eynî hêsaniyê, min ew ji berîka xwe derdixist û ew deng, pejn û hîs dikirin rêz... Bergên deftera min a biçk, mîna şevên kar û şixulên min ên pêşerojê û gotinên stranên ko min jê hez dikirin, tarî b ûn. Min rûpelên spî yên deftera xwe ya bergtarî, bi pênuşeke reş, bi rêzên şahîdên jîn û umrê min, tarî dikirin... Di wê defterê de, çend rêzên pêşîn ên rûpelên pêşîn şahîdî li gera me ya kurt a bajarê Wiyanayê dikin.

– Tu dizanî, herî zêde, kêfa min ji çi re tê, Kamuran dibêje û tîkeyeke goşt

jêdike, wê dibe devê xwe û bîskekê dicû, ez ê Goethe bi alemanî, bi zi-

manekî rewan, bixwînim!.. Bifikire!..

Fikra xwendina Goethe heyecan dide herduyan jî. Herdu, bi ken, li hev

dinihêrin. Celadet radihêje qedeha xwe ya şarabê ya krîstal û dibêje,

– Hingê em divê ji bo te û Goethe, ji bo hevaltiya we binoşînin.

– Noş, noş ji bo te û Goethe jî, eger te jê re wext hebe...  
Herdu, Celadet û Kamuran, birayên hev, hevriyên qedera hev, bi dû  
vexwarinê re, li hev dinihêrin û dikenin.  
– Êdî wexta çyînê hat, Celadet dibêje, ka dest bike, bila garson  
hesabê  
me bîne.  
Lê çavên Kamuran ne li ser garson in, ew li masa kêlekê dinihêre.  
Du  
jinên bedew di nav cil û bergên sade, lê lihevhatî de, hatine û li  
masa  
kêlekê rûniştine. Porê yekê, li gora modayê, kurt hatiye birîn, porê  
ya din gelekî dirêj e. Lêvên wan ên sor bi ken in. çavên jina ku, ji  
kêlekê, li hem-  
ber Kamuran rûniştîye jî, vedigerin ser Kamuran. Kamuran bi  
keneke sivik û bi rêzdarî, serê xwe ber bi jêr dike û silav didiyê,  
– Guten abend...

4

Guten abend! Li kompartimana ko Celadet, Kamuran û hevalê wan  
ê Fransîz dikev  
inê, mêrek û jineke pîr, li kêleka derî, rûniştine. Kamuran silav dide  
122  
wan, li bilêta destê xwe dinihêre û derbasî hundir, ber pencerê  
dibe.  
Cîhên wan li ber pencerê ne. Ew walîzên xwe yê biçûk dixin bin  
kur- siyên rûniştinê, xwe hinekî didin hev û li hember hev, li kêleka  
pencera fireh, rûdinin. Fransîz jî li ser kursiya kêleka Celadet  
rûdine. Kompartimana hinekî tarî ji bo şêş kesan e.  
– Ez hêvîdar im ko kesê Êdî neyê nik me, Celadet dibêje û ji berîka  
hundir a çakê xwe deftereke biçk û pênuşekê derdixe.  
Kamuran jî pêşî sê bîrayên Munîxê, Lovvenbräu, ji walîza biçk  
derdixe, şûşeyekê dide Celadet, yekê dide Fransîz û ya xwe jî d atîne  
ser

textê biçk ko bi pencerê ve ye, paşê jî kovareke bi zimanê alemanî, »Gesellschaft« ji walîzê derdixê û lê dinihêre.

Ew, vê êvarê, li ser riya Alemanyayê, Munîxê ne. Ew ê herin nik birayên

xwe yên biçk, Tevfîk û Safer ko li Munîxê dixwînin. Niha, piştî bîskeke, trêna, di nav êvara tarî û sar de, berê xwe bide welatê Alemanyayê û bi rê keve. Ew, gav bi gav, ji welatê xwe bi dûr dikevin û gav bi gav nêzîkî li îstasyona dawîn a rêwîtiya xwe dikin.

Celadet lingên xwe davêje ser hev, deftera biçk datîne ser çoga xwe, jê

rûpeleke nû vedike û bi tirkî, giran giran, weha dinivîse;

Pazartesi - 2. Teşrîn-i evvel. 1338 Yanê, duşemî, 2. airî. 1922...

Duşemiyeke payiza 1922-an, di pêşîra êvareke sar de, ew ji Wiyanayê

xatir dixwazin.

Me, min û birayê min, yan jî ez weha bib êjim, dostê min ê qedîm Kamuran, bi meya sor a yakûtî, serî û dilê xwe germ kiribû. Meya sor, dosta xewn ûxeyalan, barana havînên germ, leylana li pey rastiyên tahl ên jînê, ez xistibûm nav hêlekanekê û di navbera Stembol û Munîxê de dibir û dianî. Heşê min geh li nik diya min a b êdeng û çavbigirî, bavê min ê mîna heykeleke roman stûr û dengberz, Mezo, xweha min a deng ji şalûr û bil- bilan çtir, mam û metên min ên bêhejmar, şehribana delal, Saadet Ablaya mîna teyreke mader dilgerm û zarşêrîn, Canana bedenmasî, lêv û zimanxweş, lê kêmgotin, heval û dostên min ên rojên ç û neçê bû. Geh jî heşê min li pêş, rojên nediyar ên bê, jîna nezalal a piştî rêwîtiyê, kar û şix- ulên pêşerojê, evîn û hezkirinên nû yên xerîb û balkêş bû. Ez di nav filûqeyeke biçk de, li ser pêlên xurt ên hîsên têvel, ber bi vî alî û ber bi wî alî diçim û dihatim. Ez bîhteng, zîz û melûl bûm. Min ew însan, ew dev- er, ew mekan, ew dewr, ew dewr an, ew tişt û ew kes û pêwendiyên ko ez kiribûm »ez« , li pey xwe hî99 9tibûn. Ew germahiya zanîn û nasînê li pey

mabûn. Min û Kamuran, cewiyê siûda min, nezanîn û nenasînê dabû ber xwe, di payizek ji payizên bêhejmar ên umrê me de, em ji dinyayeke germ ber bi dinyayeke sar û sermayê hildikişyan. Ga v bi gav, tiştên nas kêmtir, yên nenas zêdetir dibûn. Dinya û heyama nenas hembêza xwe vekiribû û bangî me dikir.

Hema çî bigire meha me ya dawîn a Stembolê, bi hevûdudîtin, xatirxwestin û haziriyê derbas bû. Mamên min Evdirehman, Mihemed Elî, Xelîl, Murat û kurmamên me yên bêhejmar ko niha êd î ne hewce ye, ez navê wan, yek bi yek, li vir bibêjim, her, bi me re bûn. Met û dotmamên mehertim dihatin malê. Li aliyên Ca

ğ alo

ğlu û Perayê, li buroya Serbestî û

warên kurdan, heval û dostan em bi tenê nedihîştin. Hevalên me yên kur- dperwer, bi hêviya ko rêwîtiya me dê di doza kurd ayetiyê de bi kêr biya, em hembêz dikirin. Sahnê-yî weda pir bûn...

Em ji Stembolê çn Burgazê, ji wir jî, dîsan bi eynî keştî, li ser piştava

Zerya Reş, em çûn Warnayê. Ji wir, me terkî avê kir û ber bi Sofyayê, bi trêneke giran, kevn û şerpeze, ketin rê. Ji wir, dîsan bi trênê, lê îcar bi yeka hîn çtir, di bin baraneke boş de, em çn Belgradê. Li Belgradê me b ihîst ko kaxiz û pasaportên nû yên hukimeta Osmanî hew bi kar tên. Lê em, bi pasaportên xwe yên nenû, rehet, ji Belgradê çn Zagrebê, b ajarê navdar ê Hirwatistanê. Ji wir jî, em çûn... tu êdî pê dizanî... Yanê dinya û heyama nenas ko hembêza xwe vekiribû, em, gav bi gav, ber bi xwe rad ikêşand. Gelo ew dinya û heyama nenas periyê bedew a destanan bû? Yan jî ew keça pîr a şêxê cinan bû? Li milekî jî, em li vê yekê, li pêşeroja xwe ya avis difikirîn.

Gava trên b i rê dikeve, deriyê kompartimanê vedibe û keçikeke bejndirêj

û porzer dikeve hundir û li jimara kursiyan dinihêre. Di desteke keçikê

de bilêta wê, di d estê din de jî walîzeke biçk heyê. Celadet û  
Kamuran,  
her du bi hev re radibin pê da ko alîkariya wê bikin. Keçik bi ken li  
wan  
dinihêre, bi alemanî, d ibêje »spas« û tê, walîza destê xwe datîne  
ser kur-  
siya kêleka Kamuran; cîhê wê ew der e. Celadet û Kamuran li cîhê  
xwe  
rûdinin. Piştî ko keçik cîhê xwe rast dike û walîzê dixê binê kursiyê,  
ew jî rûdine. Celadet û Kamuran, bi balkêşî, li keçikê dinihêrin.  
Bîhneke xweş  
ji keçikê difûre. Eger meriv bi tenê, bi gotinekê, wê salix bide, ew  
pir  
xweşik e. Hem çavên Celadet hem ên Kamuran li ser keçikê  
radiwestin.  
Keçik li wan dinihêre, bi şermokî dikene û çavên xwe ji wan direvîne.  
– Te dixwest ko bila kes neyê nik me. Niha jî hê tu welê difikirî?

124

Kamuran, bi ken, bi kurdî, ji Celadet dipirse. Lê bêyî ko ew bersiva  
Celadet bipê, ew vedigere ser keçikê, bi kîbarî, jê re dibêje, »guten  
abend...«  
Keçik bersivê didiyê. Bersiva keçikê rê li Kamuran vedike. Ew dest  
pê  
dike, bi alemanî, jê re behsa xwe û Celadet û kurdan dike. Bîsteke  
dirêj,  
keçik, bi dîqet, li Kamuran guhdarî dike. Celadetê ko hew dinivîse  
û defter xistiye berîka çakêtê, her, li keçikê dinihêre. Gotina  
Ovidius tê bîrê; nêzîkî li wê bike, wext, wexta gotinê ye, guh mede  
aheng û li- hevhatina gotinan, bipeyive, dest pê bike, destpêk,  
destpêk, bi dû dest- pêkê re dawî tê... Celadet nahewe, ew xwe  
ranagire û dest bi axaftinê  
dike,  
– Fräulein?..

– Karlfeld, Monica Karlfeld, keçik dibêje. – Fräulein Karlfeld, ich will ihnen etwas sagen... Celadet dibêje û radiweste.

Keçik û yên din li Celadet dinihêrin da ko ew gotina xwe tamam bike.

Lê gotina ko wî dixwest bibêje, bi alemanî, nayê bîrê. Ew kêliyêkê di- fikire, lê dike, nake, gotin nayê. Dawiyê, ew, bi heyecan, ji Kamuran dipirse, »bedew, spehî, xweş, belle?..«

– Schon, Kamuran bi ken dibêje, schon... – Richtig... Sie... schon... Keçik dikene, kêfa wê ji gotin û şêweyê gotina Celadet re tê û ew bi deng dikene.

5

Gava Safter ji derî dikeve hundir, Celadet û Kamuran radibin pê, ber bi wî derin û dikenin, ji kêfan, ew bi dengê bilind dikenin.

– Kekên min hatine, keko Celadet, Kamuran hatine... Safter dibêje û bi heyecan dere rûyê birayên xwe.

Bihêle, ez, dîsan, bi alîkariya dengên qels û dêmenên nezela ên rojên bi- hurî, bêm alîkariya te... Malesef, ji jîneke xurt bi tenê dengên qels, siyên nediyar û bergehên nezela li pey dimînin. Tu jî dizanî, vejîn û şixulê ve- jandinê bi alîkariya van deng, sî û bergehên tê pê, lê ne mîna xwe ya berê. Jîn û vejîn, bêguman e, ne mîna hev in. Lê di vejînê de, hertim ders û tecrube, tahm û bîhn, tov û şopên jînê hene. Meriv dikare bibêje, vejîn siyajînê ye ko hertim diguhere, carina dirêj, carina kin dibe. Pireke zirav mîna

125

Pira Sîratê di navbera jîn û vejînê de heye. Meriv dikare ji wê pirê re jî bibêje, »Pira xewn û xeyalan.«

aima ez, niha, weha behsa tiştên, bi qewlê ewrûpayîyan, »abstrac« dikim? Ji ber Safter, ji ber bi bîr anîna birayê min ê biçk... Safter, jîrtirîn û zîrektirînê me hemûyan... serwextirîn û dûrbîntirîn,



germtirîn û geştirînê me hemûyan... lê di eynî wextê de, bêmiraztirîn û bêsiûdtirînê me hemûyan... Niha, piştî umrekî, gava ez di ser pPira xewn û xeyalan re gav dikim û xwe digihînim aliyê vejandinê, ew danê sibê yê Munîxê mîna guleke nûbişkovî tê bîra min. Heye ko ne hemû ew danê sibê, lê tiştine jê, mesela kena Safter, mîna guleke sor a bîhnvedayî tîn bîra min. Ez dibêjim, ne hemû danê sibê, ji ber ko ew danê sibê pir sar bû.

Min û Kamuran, bi navnîşana destê xwe, di wê sar û pûkê de, bi zehmetî,

xwe gîhand mala ko Safter tê de dima. Lê ew ne li malê bû. Gava xwediye malê, profesorekî navsal, fahm kir ko em birayên Safter in, wî em ezi - mandin hundir. Jixwe piştî bîskekê jî Safter hat. Belê, hingî kena Safter mî- na gulên sor ên bexçê mala me ya Kiziltoprakê bû; geş, nûbişkovî û boş.. Bi dû Safter re jî, birayê me yê din Tefîk hat. Em çar bira li welatekî xerîb û dûr gihîştibûn hev.

aar bira di oda mezin a Safter de, li hember hev rûniştine û bi kêf û henek qala herdu dinyayên ko ew di navberê de derin û tîn, dinya rojhelat, Stembol, welatê Osmanî, Kadikoy, Kiziltoprak, mala wan, bav û diya wan, bira û xwişka wan, mam û metên wan û dinya rojava, Munîx, xwendegehên Munîxê, jiyan û civata wê, keç û jinên wê, tiyatro û sînemayên wê dikin.

– Hûn ê îşev me bibin ku? Kamuran ji Safter û Tefîk dipirse. Ez bawer im, we dil nîn e, di şeva me ya yekemîn de, hûn me li vê odê hepis bikin?

– De hûn bibêjin, em herin ku, hûn çî der dixwazin? Tiya, konser, sînema, restorant, gazîno? ai? Tefîk dibêje.

– Konser, Kamuran dibêje, em hatine Munîxê ko tê de dilê musîkê hildavê, me bibin konsereke musîka klasîk.

– Îşev konsereke musîka Mahler, Gustave Mahler heye... lê, we kincên germtir divê, Safter lê vedigerîne. Hûn bi van kincên li ser we ve, nikarin herin tu derî. Hewa pir hişk e, dinya sar e.

126

6

Hewa pir hişk e, dinya sar e. Digel ko çila Alemanyayê hê bi xurtî dest pê nekiriye, dinya serma ye. Celadet, carekê-du caran, xwe dilivîne ko rabe, lê ew nikare. Bedena wî, bi gotina diya wî, bûye mîna ço. Bedena wî jan dike, serê wî diêşe. Ew divê dakeve bajêr, Munîxê û here serdana Safter ko bi sermayeke xedar ketiye û di nav cîhan de radizê. Lê ew di xwe de wê taqetê nabîne ko ji nav cîhan derkeve. Welê dixuye ko ew jî bi sermayê dikeve.

Oda wan, wî û Kamuran, a mezin tu carî germ nabe, ew çî jî bikin, ode germ nabe. Ji binê derî, ji aliyê rojava, pencera mezin, her ba, bayekî sar û tûj, tê. Ew li saeta li ser masa kêleka xwe dinihêre. Saet ber bi nîvroyê hêdî hêdî dizîvire. aare nîn e, ew nikare rabe. Ew xwe hinekî din dixê bin lehîfa germ û wê dikişîne ser xwe.

Di wan rojên çileyê me ya pêşîn a Alemanyayê de, di oda me ya mezin û sar de, ez bi tenê bû m. Kamuran, ji xwe re, kincin û palto yekî germ dabû dirûtin û ji me xatir xwestibû û çûbû Berlînê, nik dostekî xwe. Min jî kincine germ kirîbûn û kincên min ên şevê û lehîfa min a bi hirî ya alemanî jî germ bûn. Lê çî feyde! Dinya sar, oda me seqem bû. Mîna ko em ne li odeyekê, lê li zozanan bûn!

Me li Munîxê nikarîbû tu cîh, ode, pansiyon peyda bikira. Ji ber rewşa piştî şer, xelkê gundan û doralî koç bajêr kiribûn û bajar vegirtibûn. Bi alîkariya b irayê me Tevfîk, me li gundekî biçûk ko nêzîkê Munîxê bû, Obermazing, li nik qesabekî, odeyê fireh peyda kir. Xaniyê qesab bi duqatan lêbûbû. Qata jêrîn d ûkana wî ya qesabiyê bû. Qata jorîn jî mala wî bû. Li paş xênî, bexçeyekî fireh û dirêj ê malê hebû. Li kêleka bexçê jî bîreke arteziyenê hebû. Di qata jorîn de, odeyê mezin vala bû. Me ew od e, mehê bi hezar û sêsed markan, kirê kir û walîzên xwe û tiştên xwe yên hûr ko me ji Stembolê bi xwe re anîbûn, tevî kemaşa Kamuran, birin odê û em li wir bi cîh bû n. Ode fireh bû, lê em, nemaze Kamuran, hînî bi hev re, di odeyekê de mayînê, nebûbûn. Lê çare nîn bû, ne cîhên din hebûn, ne jî êd î quweta me dest dida.

Ji Stembolê, em bi tevî derketibûn. Me pere û zêrên xwe qulipandibûn ser markên alemanî, me bi deh hezaran mark xistibûn

berîkên xwe da ko em çar bira, çar neviyên Mîr Bedirxan, li Alemanyayê, muhtacîtu kesî, tu tiştî nebûna. Li Stembolê em welê fikirîbûn. aaxa em gihîştin Munîxê, me dît ko hesabê me yê Stembolê şaş bû, ji binî ve şaş bû! Markên me, ez nizamim, di sedî de çend sed, belê çend sed, ji qîmeta xwe, winda

127

kiribûn...Vê yekê jîna me, bi carekê, guherand, jîna me xist ser rîyeke gele kî kirêt û dijwar. Bi dû hatina me re, bavê min bihîst hezar markên din ên ale- manî, ji me re, şandin. Lê mark bêqîmet û jîn buha bû. Di ser de jî, markê her roj qîmet winda dikir. Kurdan gotibû; pere xulamekî qenc, lê axa yekî xirab e. Pereyê ko heta hingî xulamê me bû, di wan rojên sar ên çilaAlemanyayê de, êdî dixwest axatîyê li me bike. Jîna me, bi carekê, bi her awayî, guherîbû. Em ketibûn, em bûbûn derketî.

Celadetê ko tevî kincan ketiye bin lehîfê, ji xewa giran, hişyar dibe. Ziman û gewriya wî zuha ye. Qirika wî dişewite. Ew hinekî xwe dilivîne û li do ra xwe, li saetê dinihêre. Saet ber bi êvarê, hêdî hêdî, dizîvire. Ew bi hêdîka ji nav cîhan derdikeve, cixareyek û hestê ji ser masê werdigire û ber bi pencera fireh dere. Êşa serê wî hinekî kêmbûye, lê ew pîr bêtaqet

1. Ew li der, li darên bexçê, ewrên girtî, dinya girtî dinihêre. Wî hê li vî

welatî misteke tav nedîtiye. Tav her li pey ewrên girtî ye. Ew li vî gundî,

li vê odê çî dike? Eger niha tişteki bi serê wî de bê, haya kê dê jê hebe?

Heta kengî ew ê li Alemanyayê be? Li Stembolê, li welêt ko ew carina, ga-

va Mezo û Hîkmet ji wan re rojname dişînin, hay jê dibin, niha çî dibe,

çî diqewime?

Cixare di dev de, ew vedigere ser textê razanê yê Kamuran, radihêje ke -

mança ko li ser cîh e, kemañçe û kevanê wê ji sandûqa wê derdixê û dîsanvedigere ber pencerê. Bi qasî demeke dirêj, ew, hêd î hêdî, heşê wî li derekî din, gewrî zuha, çav li ser bexç û bîra li kêleka bexç, li kemañç dixîne.

Ew, bi kemañça Kamuran a neakordkirî, dengên musîka çend stranên

nîhawend û kurd-î hicazkar ên osmanî, bi bexç digihîne. Paşê, piştî de- mekê, ew diweste, bêgav, dest ji kemañç berdide û dîsan tê ser cîhê xwe.

Ew li ser cîhê xwe rûdine û cixareyeke din vêdixê. Wext ê niha çawan here? Tefîk ko bi qasî niv saetê ji gund dûr dixebite, çima nayê?

Bi bîhtengî, ew radihêje kitabek ji kitabên ser masê û rûpelên wê diqulipîne. Kitaba zirav û dirêj ko rûpelên wê zer bûne, bi fransizî ye. Tê de şîrên şairên navdar ên fransiz hene. Di rûpelekê de şîreke Victor Hugo »A ceux qui sont morts pour la patrie« heye. Ew wê, bi deng, dixwîne. Piştî şîra Victor Hugo, şîrên Lamartine »le poete mourant« , ya Alfred d u Vigny »La mort du loup« û ya Charles Boudelaire »le balcon« hene. Celadet wan jî, li ser textê xwe dirêjbûyî, bi deng, dixwîne. Bi dû van re jî şîreke Lamenneais li ber çavê wî dikeve. Navê şîra biçk bala wî

128

dikişîne; l-exilé... Bi gotina osmaniyan sirgûn kirî. Celadet hêdî hêdî wê

dixwîne. Careke din, careke din, bi dengê berz... Ev şîr ko tê de behsa xerîbî û hîsên xerîbiyê dibe, şîra jiyana wan e. Mîna ko Lamenneais ew li

ser wan nivîsiye. Celadet ji berîka çakê wê pênûseke reş derdixê û

stêrikek li ser rûp el, li kêleka şîrê, çdike. Celadet divê vê şîrê wergerîne

kurdî, zimanê bav û kalan.

Ma çima ew niha dest pê nake? Kaxiz? Ew di xwe de nabîne ji ser cîhan

rabe. Ew li ser rûpelê, sernivîsa şîrê, bi fransizî, dinivîse; exilé... Lê exilé bi kurdî çî ye? Xerîbî? Sirgûnbûyî? ai? Mana exil-ê derketin e. Ma çima ne derketin û derketî?.. Belê, derketî... Celadet bi qasî kêliyê difikire û dîsan, li ser rûpela kitabê, bi tîpên pir biçk herdu rîzên şîrê, lê bi kur-

dî dinivîse: Terka welatê xwe da û kete dinyayê... Xwedê rêberiya derketiyan bike!..

Celadet hin rîzên din jî, giran, dixwîne û difikire. Lê na, ew nikare, êşa

serî dîsan zêde dibe. Ew kitab û pênuşê datîne ser masê, lehîfa germ vedike û dikeve nav cîhan. Ew li kêranên dirêj ên bana odê dinihêre û li gotina xwe ya kurdî difikire û wê dubare dike; derketî, derketî...

129

130

FOTOGRAF 8: »Also sprach Zarathustra...« oder »uns umspülen hunderttausend wogen/alles reizt uns, manc herler gefaelt...«

1

aar derketî, çar bira; Celadet, Kamuran, Tewfîk û Safter. Li welatekî xerîb, li bajarekî xerîb, her çar li kêleka hevûdu rawestane û bi ken li hevûdu dinihêrin. Sal, destpêka salên 1920-an in. Wext, wexta serûbinî, tevlihevî û geremolê ye. Cîh, navenda geremoliya dinê, deriyê do û îro, Munîx e.

aar bira, çar lawên Emîn Alî Begê Bedirxanî, çar neviyên mîrê kurdan

Bedirxan, li pê, li nik hevûdu rawestane û bi hev re dipeyivin. Welê dix-

uye ko haya wan ji fotokêşê nîn e. Fotokêş, destgirtiya birayê biçk Safter, Pelikan, bêyî ko haya wan jê hebe, pê li qumçika

makînê dike û fotografeke din li fotografên romana zêde dike, -bêyî ko

haya wê jê hebe.

Di hemû umrê wan ê dirêj, balkêş û ji hevûdu pir cihê de, heye ko bi

tenê ev fotograf, her çar birayan li nik hevûdu nîşan dide. Bahoza şerê

cîhanê û aloziya destpêka salên 1920-an, ew li Munîxê anîne nik hev. Lê dewr û dewranên bê dê wan, yekcar, ji hev veqetîne. Veqetin û hesreta ko

du stûnên esasî yên cîhana kambax a derketinê ne, dê, bi her awayî, mohra xwe li jiyana û qedera wan xîne. Lê di vê fotografê de, tu şopên ro-

jên bê naxuyin. Haya wan hê ji rojên bê nîn e. Ew li kêleka hevûdu sek-

inîne û bi ken dipeyivin. Safter destê xwe ber bi Tevfîk kiriye û bi ken jê re tiştêkî dibêje. Singa wî d erketî, serê wî hinekî li pê 99 e. Tevfîk destê x we yê rastê rakiriye û bi tilî Safter nîşan dide. Ew jî dikene. Kamuran destê xwe biriyê ser serê xwe û bi po rê xwe dilîze. Ew jî bi ûsil dikene. Herç Celadet, b irayê mezin e, wî jî, mîna piraniya caran, herdu des tîne xwe xis- tine bêrîkên pantolonê, xwe hinekî ber bi pêş xwar kiriye û li Safter dini- hêre. Kenekî geş li ser rûyê wî ye jî.

Ken, kêfxweşî û geşî hakîmî vê wênê ye. Mîna ko ew ji mirinê, şewat û

131

hilweşînê nereviyane. Mîna ko mirin, bêgavî û zehmetiyên nedîtî yên derketinê ne li pêşiya wan e. Pelikan, keça dilsoz û porzer, evîna man û nemanê ya Safter, bi makîna xwe ya nûkirî, nêrîn û kena wan a boş dike nemir.

Her çar birayan hevûdu, ji nû ve li Munîxê dîtine. Munîx, bajarê medeniyeta germanî, navenda çanda Awrûpa Navîn, ji wan re bûye konaxek. Belê, konaxeke nû ko li ser riyêke dirêj e. Ew ji welatê

rojhilatê, ji şerekî xedar ko ew ji hevûdu veqetandibûn, ji doz û têkoşîneke biserneketî tên. Di heyama do de, wan zêde wext nîn bû ko bi hev re bûna, hevûdu bidîtina. Her yek li derekî, bi şixulekî mijûl bû. Ji lewre, ew hevû- du zêde baş nas nakin. Ji bilî terbiye û perwerdeyiya malê, edet û ûsilên malbatê, tiştên wan ên yekgirtî ne zêde ne. Ew li Munîxê, ji nû ve, digihên hev, hevûdu dinasin... Lê piştî Munîxê? Bi dû konaxa Munîxê re?

Ji kena wan dixuye ko ew zêde li vê yekê, li konaxên bê nafikirin. Bervajiyê bûyer û serpêhatiyên Munîxê, ev fotograf çar birayên jixwerazî, bextiyar û kenê wan a ko hemû fotograf vegirtiye, nîşan dide. Bi kincên xwe yên modern, bi rawestana xwe ya serbest, bi nerîna xwe ya bawertijî, mîna ko her çar bira dixwazin, di vê fotografê de, bi ken, vê yekê bibêjin; dinya bi dor e, rojekê geş e, rojekê zor e. Îro dora me ye, pêr dora Mîr BedirXan bû, do ya bavê me bû, îro ya me ye. Digel her diwariyê, em îro bi hev re ne, gihîştine hev, bi hev re quwet in; dest destan dişo, vedigere rûyan dişo. Bêguman e ko berî îro jî wexteke jiyayî hebû, piştî îro jî dê hebe, lê îro, esas e, navend e.

Li ser hemûyan cil û bergên nû û modern hene. Hemû bi gomlegên spî û bi qrawat in. Ji yên Safter pê ve, kincên hemûyan, kincên klasîk ên ewrûpayî ne. Kincên Safter, bi gotina Pelikan, »sportîv« in. Di esasê xwe de, tu ferq di navbera kincên wan ên do û yên îro de nîn in. Do jî, wan, li bajarê piralî, pirçandî Stembolê, dîsan, kincên ewrûpayî li xwe dikirin.

Kinc û lixwekirina wan nêrîn, fikir, hîs û dîtînen wan jî diyar dikin; ew ne dûrî cîhan û medeniyeta ewrûpayê ne. Rabûn û rûniştina wan herçend ya kurdan û welatê rojhilatê ye, ewçend jî ya ewrûpayê ye. Terbiye, xwendin û perwerdeyiya ko wan wergirtiye, ew kirine pirên navbera du cîhan û medeniyetên ji hev pir cihê. Ji lixwekirina wan diyar e ko ew bi qasî cîhan û medeniyeta rojhelatê, aîdê cîhan û medeniyeta rojava ne jî. Loma jî, meriv dikare bibeje, di fotografê de, kenê wan boş, rawestana wan rehet, tevgera wan serbest e.

Fotograf li ser kolanekê tê kişandin. Welê dixuye ko ew li rê ne, ber bi

132

derekî derin. Li pey birayan çend xaniyên ko bi lêkirina germenî ava bûne, dixuyin. Li ser dîwarê xaniyê hema li pey wan, di nav lewheyêke biçk de, bi tîpên latînî yên germenî, Galeristrasse, dinivîse. Li pey xaniyan jî, dêrek û birca wê dixuye. Ken, rawestan û tevgera birayan ne li dijî van avahî û perçn din ên wênê ne, ji bervajiyê, ew hevûdu temam dikin.

Birayên Bedirxanî, neviyên rêberê kurdan, ji welatê xwe pir dûr, li ser kolaneke Munîxê rawestane û bêyî ko li rojên bê bifikirin, bi çavên germ, li hevûdu dinihêrin û dikenin...

2

Birayên Bedirxanî, Celadet û Kamuran, neviyên rêberê kurdan, ji welatê xwe pir dûr, li aşxana Unîwersîta Munîxê rûniştine û bêyî ko li rojên bê bifikirin, bi coş, li hevûdu dinihêrin û dikenin.

Herduyan jî îmtihanên xwe bi serfir azî dane û derbasî sinifeke nû bûne. Celadet dersên ziman, çand û siyasetê dixwîne, Kamuran jî doktora xwe ya hukukê çêdike. Roj bi roj, ew dikevin nav civat û çanda Alemanyayê, şirîtiyêke bikêr bi ziman, medeniyet û çanda Alemanî re tînin pê. Her çar bira jî dixwînin. Safter, birayê biçk, xwendina xwe ya kîmyayê xelas kiriye û dest bi îhtîsasê kiriye. Tevfîk bûye muhendîsê daristanê, dest bidoktorayê kiriye û niha li ber xelaskirinê ye. Kamuran ko hê li Stembolê awikat bû, niha, bi xurtî ketiye nav refên kitabxanên Munîxê û li hukuka enternasyonal û ya medenî ya Ewrûpayê hûr dibe. Celadet ko ji bêgaviyê terkî welêt kiribû, bi xurtî ketiye nav rûpelên çand, felsefe û edebiyata alemanî û zimanê alemanî û îlmê zimên hîn dibe.

Ew îro, di dewreke gelekî kambax de, bi xeberên baş, rojêke çê derbas dikin. Celadet simbêlê xwe, hinekî, gurtir berdaye. Lê rû û bedena wî ya hinekî gir, niha, jartir dixuye. Kamuranê ko her jar bû, niha simbêlekî zirav jî, li jariya xwe zêde kiriye. Xwarina li ber wan



gelekî basîd e; çend serî kartol, çend tîke goştê dewêr ko bi zehmetî tê cûtin û du şûşe bîra Bayernê.

– Ab-brühen, Herr Doktor, Celadet dibêje û qedeha bîrayê radike.

– Noş, birayê ezîz, noş, Lê hê tu li ku, doktorî li ku.

– Na, na zêde nema, bi xêr, ber bi serê salê, ez ê bi nameyeke xweş, mizgîniya doktoriyê bi bavo û kek Sureya bigihînim.

– Eger tu rastiyê bixwazî, bawer bike, ez naxwazim doktor bim jî. Ez ê

li ko û çawan doktorî û awikatî bikim? Ez vê doktoriyê ji bo welêt dikim.

Lê ka welat li ko ye? Em ê çawan herin welêt û li wir bixebitin?

133

– Kamuran, birayê min ê hîstenik... ma dinya dê her weha bimîne, çerxa felekê dê her weha bizîvire? şaş mebe, ronahî li pey vê perda tenik a reşahiyê ye, wîcdan ê bi ser keve, mêjî dê, ji xewa kûr, hişyar be.

– Xwezî... xwezî... heşê min jê tişekî nabire, lê ez dîsan bibêjim xwezî... – Bila heşê te jê bibire, ji bîr meke, rojekê ne bi tenê ji şevê, lê ji roj û

şevê tê pê. Dawiya dawîn, em ê di rojêke pîroz a Xwedê de, tevî van zanîn, tecrube û serpehatiyên xwe, tevî keser û kêfxweşiyên xwe, vegezin mala

xwe... De binoşîne, ji bo te û me.

Piştî vexwarina bîrayê, Kamuran saeta xwe ya bi kostekê ji berîka êlega

xwe derdixe, lê dinihêre û bi lez radibe,

– Mixabin, ez divê herim, ez dereng mam...

– Bi ko de? Ji Sureya Abê nameyek hatiye, min ê ew ji te re bixwenda,

bi ko de derî?

Kamuran bi tenê dikene û dibêje, »mepirse... çavşînê lê, lê...« û dizîvire,

dere. Celad et wan çend dilopên dawîn ên bîrayê jî wedixwe û li şênîyên

li maseyên doralî dinihêre.

aaxa min ew gotin ji Kamuran re digotin, di esasê xwe de, min xwe jî bi wan teselî dikir. Ma gotinên qelaw ên li ser xurtî û baweriyê, ji xwed iyê gotinan pê ve, dikare kê bixapîne? Rewşa me, ne tu rewş bû. Rewşa me şerpeze, halê me pêrîşan, neçarî û kambaxiya me bêpayan bû. Roj ji rojê xirabtir, bû yer ji bûyerê kirêtir bû. Alemanya bi leza birûskê ber bi geliyekî bêbinî gêr dibû. Aboriya Alemaniya mîna hûtekî, mîna geremola lehiyekê her çi dihate berê dadiqultand. Diravê Alemaniya mark, mîna pelê ber bayê, berfa ber tavê, her roj, her saet, her deqîqe, qîmet winda dikir. Dolar, bêpayan bu ha û bilind dib û. Li Alemaniya jihevketî û hilweşiyayî tu kar û şixul jî nîn bûn ko meriv bi dest xista. Li milekî, li Alemaniya rewş weha kambax bû.

Li milê din, bav û diya min, tevî Mezo, ji Stembolê û Tirkîyê derketibûn û

çûbûn Misirê, nik kekê min Sureya. Em bi vê yekê kêfxweş bûn; wan xwe ji şûrê ruhistinê ko xelas kiribûn. Lê bi çûna wan, kahniya pereyên ko ji me re dihatin şandin jî miçiqîn. Carina Saadet Abla û merivên me yê din ji me re hin d olar dişandin, lê ew jî, ji ber aloziya aborî û bankeyên Alemaniya, nediketî destê me. Di ser de û tiştê herî xirab, em nikaribûn vegeyriyana Stembolê. Li gora name yê ko dihatin, rewşa siyasî li wir jî gelekî xirab bû. Name weha xelas dibûn; gidî, hûn bin, hûn fikir li vegeyriyê nekin...

Me dê çi bikira? Em mîrên kurdan li Munîxê şerpeze bûbûn. Navekî gi-

134

ran û mezin li gundekî wêran bû. Me dê xwe bi ko de bavêta? Kî d ê bihata hawara me? Felek bi girane û zompan ketibû ser me, mêjî, heş, dil û zikê me dihenciqand. Bi taybetî jî zik, zikê b êşerm û teres ko her birç bû...

Celadet ji berîka pantolonê xwe pereyên xwe derdixe û lê dinihêre. Piştî ko wî heqê xwarin û herdu bîrayan da, pere têra du, te nizanîbû, sê rojan

dikir. Piştî du-sê rojan? Xwedê kerîm e. Bi bîhtengî ew ji berîka çaketê xwe pakêta cixarê derdixe û cixareyekê vêdixe. Digel neçarî û xizaniyê, bêguman, jiyana xwendevaniyê, xwendevaniyeke weha ko cîhaneke nû li

berê vedike, hemû mêjî û dilê wî vedigire, xweş e. Lê heta kengê ew ê

bikaribe xwe rabigire? Ew bi destê xwe yê çepê jî bi kêra li ser masê dilîze

û li pirsiyarên weha bingehîn ên jiyana xwe ya Munîxê difikire.

– Der prinz BedirKhan?

Celadet serê xwe ji ber masê radike û li aliyê deng dinihêre. Jineke ciwan a porzer û çavşîn, bi ken, lê dinihêre. Mîna ko Celadet ew dîtiye, lê ew nikare wê derxe.

– Hûn ne Mîr Celadet in? Jina ciwan, bi alemanî, jê dipirse. Celadet bi serî bersiva wê dide û li çavên wê dinihêre. Wî ev jina hanê ko çavên wê mîna zeryayekê stûr û şîn in, li ko dîtiye, ew wê ji ko dinase?

– Monîka... jinik dibêje.

Celadet, ji nişka ve, radibe pê û diqîre, – Fräulein Karlfeld... Monika Karlfeld! Fräulein Karlfeld... Monika Karlfeld.

3

Gava Celadet û Monika ji trêne peya dibin, ew wê bi Safter û Pelîkana ko li hêviya wan in, dide nasîn.

– Monîka li unîwersîtê doktora felsefê çêdike... serpehatiya min û Monikayê gelekî balkêş e. Ez ê ji we re behs bikim. Di rojêke pir xweş a havîna 1923-an de, Celadet û Monika, li istasyona trêne ya Dikerteyê peya dibin. aaxa ew ji trêne peya dibin, tîrêjên xurt û rengîn ên tavê çavên wan digirin. Piştî hevûdunasîn, hembêz û silavan, Celadet û Safter radihîjin walîzan û ew bi rê dikevin. Celadet û Monika dê, ji bo çend rojan, mêvanên Safter û Pelikanê

bin da ko ji keft û lefta bajêr û zehmetiyên xedar ên jiyana rojane, piçekî, bi dûr kevin. Safter û Pelikan li gundekî biçûk û şêrîn dijîn. Ji ber nexweşiya Safter, wan xwe ji bajarê mezin, lez û beza jiyana bajêr vekişandine û hatine li gundekî bêdeng û aram ko nêzîkê bajêr e, bi cîh bûne.

135

Safter, hema çî bigire, hertim, nexweş e. Carina ew bi zekemê dikeve, carina serma digire, carina bi kuxikê dikeve. Digel ko ew gelekî girs û lihevhatî ye, b edena wî mîna şitila ber avê, zîz û tenik e.

Celadet û Safter li kêleka hevûdu, Monika û Pelikan jî, çend gav, li pêşiya wan, li ser riyêke pir xweş û hêşîn, dimeşin. Herdu aliyên rê bi daran tijî ne. Rê mîna tabloyeke resamekî hoste li ber wan dirêj dibe û dere. Dar, tîmsala dem, dewr û heyaman, ko piraniya rojên salê tazî û stûxwar in, niha, bi hemû bedewiya xwe ya havînê, bi hemû hê şinahî û zelaliya pelên xwe yên spehî û bi comerdî, rê nîşanî wan dide. Tav û tîrêjên wê, bi şewqeke rengîn, li ser eniya Celadet û Safter dibiriqe.

Bîhneke xweş ji hawirdor difûre; tabîatê kirasê xwe yê rengîn li xwe kiriye û direqise.

– Celadet Abi, tu westiyayî? Tu dixwazî, em hinekî bîhna xwe berdî?

– Na Safter, Celadet dibêje. Eger tu newestiyayî, ez newestiyame. Jixwe

ez bawer im, rîya me jî zêde nema.

– Na, piştî vê riyê, em xwe digihînin erebê.

– Safter, min kitabên şîrên fransîzî jî bi xwe re anîne, eger me keys hebû, em li ser hinan bixebitin.

– Bêguman... bi rêberiya te, em ê gelek şîrên hêja wergerînin zimanê

kurdî ko pir hewcedar ê vejîn û nûjeniyê ye...

Dawiyê, te gotin anî ser wan rojan... dawiya dawîn, te gotin bir û anî û li do- ra mirinê gerand, gotina edebî bi mirinê gîhand...

Safter mir... Sê sal bi dû wan rojên ko tu niha bi gotinên edebî taswîr dikî re, li

nex weşxaneyeyeke Munîxê, d i odeyeye sar de, serê wî li ser çoga Pelikanê, Safter çavên xwe, bêveger, girtin. Ji Pelikanê pê ve tu kes li nik wî nebû. Neez, ne birayên min ên din, ne xweha min, ne bav û diya min û ne jî ji mal- bata me ya bêhesab mezin kesek... Hingî ez û Kamuran li Lubnanê, kekê min Sureya li Misirê, dê û xweha min li Stembolê û bavê min jî... bila gotin, gotinê veneke, gotin li gotinê zêde nebe...

Safter, bira, heval û alîgirê min ê jînê, bi qewlê Amojna Sitî, roniya çavê

min, di wê xortiya xwe ya bedew de, ç, -bêyî ko xatir bixwaze, bêyî ko li me, nemaze li min bifikire. Nexweşiyeyeke zirav û teres ew bir diyarê rehmetê. Mirina Safter ez jî kuştim. Tê gotin ko meriv carekê dimire. Na, ev

136

ne rast e. Meriv du caran, mîna min, pir caran, car bi car jî dimire. Bi du mi-rina Safter re, ez gelek carên din jî mirim. Lê cara yekemîn, ez bi Safter remirim, nîvê dilê min jî pê re çû axa axretê.

Safter ko ewçend li ser xwe, ewçend lihevhatî bû, ewçend ji sporê, bok-

sê, hespan, nêirê, masî û masîvanîyê hez dikir, ewçend dilê wî ji bo kur- dan, welatê wan, zimanê wan davêt, ewçend ji însan û însanîyê hez dikir, nikarîbû xwe li hember nexweşiyên basîd û biçûk, mîna serma û bronşîtê, rabigirta. Wî agir bi dilê me xist û çû. Di rojêke şilî ya çila Alemanyayê de, Pelikan, bav û diya wê û du hevalên Safter ên alemanî, bi tenê ev merivên bi qasî tiliyên destekî, bedena Safter a çeleng, bi bédengî, li bin axa şil û sar a Heidelbergê veşartin.

Mirin li kal û pîrîtiyê tê. Kal û pîrîtî heyama pêşîn a mirinê ye. Gava be-

den, gav bi gav, xwe ji xewa ebedî re hazir dike, kal û pîr bi deng û pejnên mirinê dihesin. Lê ya yekî nola Safter ko ewçend ji mirinê dûr bû?.. Ez çi bibêjim?

Di wan rojên ko tu niha behs dikî de, birayê me Tevfîk xwendin û dok-

tora xwe tamam kiribû, ji me xatir xwestibû û vegeriyabû Stembolê. Wîriyek, li gora xwe, dabû ber xwe. Safter jî xwendina xwe tamam kirib û. Lê ew venegeriyabû. Mîna niha tê bîra min, Safter weha go tibû; »ez ê çawankekên xwe Celadet û Kamuran terk bikim û herim? Em ê, bi hev re, ji bo zi- man, çand û edebiyata kurdî bixebitin.« Ew û Pelikanê mabûn. Lê xwezîew biçna Stembolê, heye ko hawa Stembolê lê bihata...

Herwekî ko te jî got, di wan rojan de, Safter û Pelikan li gundekî gelekî

xweş dijiyan. Bîhna min jî teng, zikê min birç, dilê min bi kul bû. Pere nînbû, nan û x warin nîn bû, araq û vexwarin nîn bû, cixare û qelûn nîn bû, kar û şixul nîn bû, xeber û nûçeyên baş nîn bûn. Tu tişteki ko hinekî bîhna min veda, ez kêfxweş bikirama, nîn bû. Dolarekê hilkişiyabû duwanzdehezmar markan. Xwarin û vexwarinê jî li gora vê nispetê kirasekî ji agir li xwe kiribû. Xwarina min jî, li gora rewşê, daketibû vî halî; nan û kartol, av û kar- tol, kartol û av, kartol û kartol!.. û min dest pê kiribû cil û berg û kincên xwe difirotin da ko min bikaribiya ew kartol jî peyda bikira. aakêt û pantolên min, roj bi roj, kêmtir dibûn.

Di halekî weha de, çaxa min keys didît, ez diçm gund, nik Safter û Pelikanê da ko min hinekî bîhna xwe berda. Di wan rojên gund de, ez û Safter her li ser çand, edebiyat û zimanê kurdî dipeyvîn. Ji bo dewrên bê, me plan û proje çdikirin. Safter her dixwest ko me şîrên fransîzî wergerandina zimanê kurdî. Me hin rêz, bi hev re wergerandin, lê wî tu

137

carî wergerên weşiyayî, şîrên fransîzî bi kurdî, nedîtin. Ev daxwaza wî jî bû kulekî û kete hundirê min.

Mîna gelek aliyên jîna me, keser û bextiyariyên me jî cêwî ne. Bi kesera

Safter û daxwazên wî yên qurmiç, min ew şihîrên ko me bi hev re dixwendin, wergerandin kurdî û di kovarên xwe de weşandin. aaxa min kovara xwe Hawar di destpêka salên 30-an de, weşand, di hejmarekê de, li ser wergera şîrekê (eger ez ne şaş bim, hejmarek ji yên 30-an bû), min weha nivîsî;

»Sefdo, lawecan! Di sala hezar û neh sed û bîst û didowan de em hati-

bûn Mûnîxê. Ez û kekê te Kamiran. Em şikiyabûn. Zora me çbû. Felekê poşikê reş kêşabû ser qedera Kurdistanê. Êdî di warê siyasetê de tu hêvî nemabû. Me tev de digot: Ziman, xwendin û nivîsandina zimanê me; bi tîpên x weser, bi tîpên kurdî. Belav kirina kitêb, kovar û rojnaman. Min ji çiyayên Refanê ji te re elfabeke kurdî anîb û. Tu hînî wê dibûyî. Te digot; - ez gelek kêfa xwe ji şîreke Elfred de Vinyî re ditînim: Mirina Gurî. Rojekê ez ê wê wergerînim kurmanciyê û wê belav bikim.-

Ev deh, dwanzdeh sal in, kitêb û kovar bi zimanê kurdî û bi tîpên kurdî

têne belav kirin. Lê felekê tu beriya wan belav kirî. Feleka bextreş, mîna Kurdistanê poşike reş û tarî kişande ser canê te yê tenik û çeleng jî. Bi hêviya ko giyanê te yê pak pê bihese û pê şa bibe, ev e, min -Mirina Gurî- wergerande kurd manciyê û pêşkeşî giyanê te kir...«

Min, gotin bi gotin, weha nivîsî û ew pê şkeşî tevî şîrê weşand. Hingî, bi

tenê hingî, min xwe, bi qasî mistekê, bextiyar hîs kir. Lê bi dû re, dîsan bîh- na mirinê dor li min girt.

4

Bîhna mirinê dor li Munîxê girtiye. Bajarê huner û musîkê, die weltstad mit herz, niha dilê xwe ji kîn û nefretê, ji mirin û kuştinê re vekiriye. Bajarê kêfê, niha, bûye bajarê keserê. Tava ko jixwe pirî

caran winda ye, niha, yekcar ji bajêr xatir xwestiye, Bajar, avahî, qesr, dêr, birc, heykel, kolan û navendên wî yên çand û hunerê, di bin ewrên tarî û girtî de, niha, şahîdî li esebiyetê dikin. Bîhna xwîn û mirinê dor li avahiyên spehî yên barok û gotîkê digire. Bajarê kevnar ko bi rengêkî

qurşûnî xwe xemilandiye û bûye navenda hunera germenî, niha, keserti-

jî û bêhuzûr e.

Cîhan, Alemanya, Munîx û Celadet rojên pir dijwar derbas dikin.

Bîhn li wan çikiyaye. Alemanya ko ji ber krîza nedîtî ya aboriyê li ber î-

138

tixarê ye, bi bûyerên siyasî û civakî diçelqe. Alemanya, navenda Awrûpayê, li pey riyên nû û çareyên saxbûnê ye. Herkes ji hev dipirse; wohin? Bi ko de? Alemanya bi ko de diçe? aare?

Digel ko hê çare ne xuyane, alemanî didin pey tevgereke nû; nasyonal

sosyalîzm. Nasyonal sosyalîzm ko bi kurtî jê re dibêjin »tevgera nazîst«, bi

fikir û gotinên nû, bi tevger û awirên ecêb, bi çavsorî û cesareteke dînî

bala hemû alemanan dikişîne. Li mezintirîn bajarên Alemanyayê, Berlîn

û Munîxê ko bingehen wan ên herî qaîm in, ew pêl bi pêl fireh dibin. Tevî ko dewlet û dezgehên wê yên kevn li ber xwe didin, li Munîxê, ev tevgera nû, pêl bi pêl bajêr vedigere.

îro, nehê meha dehan a 19

23-an e. Bajar hê jî radizê. Berbang hêdî hêdî zora şevê dibe û stêrkan

bi dûr dixê. Hûnikahî, bayê ber destê sibê, xwe bi oda biçk a Celadet jî

digihîne. Celadet ranezaye. Paltoyê wî yê reş li ser milên wî, ew li ber masa biçk rûniştîye û bendeke biçk, ji bo rojnameyeke alemanî,



dinivîse. şûşa şarabê ya li ser masê vala ye. Qelûneke reş a vemirî,  
stûxwar, mîna şûşê bêkêr, di nav xwelîdankê de ye. Ferhengeke  
mezin a alemanî-

fransizî, deftera ko Cananê dabûyê û çend kitabên din, tiştên serê  
masê

temam dikin.

Mîna bajarê Munîxê, Celadet jî esebî, bêhuzûr, eciz û bêgav e. Wî ji  
oda xwe ya biçk a li ser Galeri strassê bar kiriye û hatiye vê oda biçk.  
Odeyên biçk, teng, bêhewa û bêronahî bûne para wî. Oda wî, na ne  
oda wî, mala wî, bi tenê çar gav in. Mîna çira Aladdîn, cîhaneke pir  
fireh ketiye nav vê oda çargavî; cil û bergên wî, kitab û defterên wî,  
jiyan û

tecrubên wî hemû di nav vê oda teng, nizm, sar û tarî de ne. Ew di  
vê odê de xwe mîna şêrekî ko ketiye nav qefesekê hîs dike. Lê ew  
dikare çi bike, çi ji destê wî tê? Ew, derketiyê welêt, roj bi roj,  
dikeve, mîna ko ew di nav

bîreke bêbinî û tarî de be, ew her ber bi jêr dibe.

Xeberên Stembolê yekcar nexweş û kirêt in. Berî niha bi çendekê,  
Saadet Abla jê re nameyeke dirêj a dilsoj şandibû û tê de weha  
gotibû;

»Bu satý

rlarý

gozyaşlarý

yla yazýyo rum...« û nama xwe bi van rêzên tarîxî ko

jiyana Celadet û berê rûpelên bi aliyekî nû dida, xelas kiribû;

»mixabin, hezar mixabin, êdî riya te girtiye...« Rejîma nû ya  
Tirkiyê, serekiya Mistefa Kemal Paşa, vegera Turkiyê li wan qedexeyê  
kiriye. Mistefa Kemal Paşa, xebat û tevgerên Emîn Alî Beg û gera  
Celadet û Kamuran a welêt ji bîr nake, bav û herdu birayan li dijî  
xwe tehlûke

dibîne û bi tu şertî li vegera wan razî nab e. Mistefa Kemal Paşa a îro  
desthi-

139

lat e û desthilatî bi zimanê xwe yê taybetî dipeyive.  
Li milekî ev... Lê li milekî jî Canan, nebûn û windabûna wê... Mîna ko ew ketibe heft qat binê axê, Canan bi carekê winda bûbû. Jê ne deng û hes, ne nivîs û nameyêk dihat. Berî ko ew li Stembolê ji hevûdu veqetin, wan gotina x we kirib û yek; heta ko rewşa Celadet b aş diyarbûya, ew ê ji hev veqetî bijiyana. Lê gava ko rewş diyar bû, wan ê, îlam, xwe bigihan- dina hev. Heta hingî jî wan ê, hertim, name ji hev re binivîsa. aaxa navnîşana Celadet kifş bû, wî dê nameyek ji wê pansiyona Ca ðalo ðluyê re bişanda. Hevalê Celadet, kurê x wediyê pansiyonê, dê name bi Cananê bigihanda. Bi vî awayî, haya wan ê ji hev hebûya. Bi k urtî, q ewlê wan we- ha bû. Celadet ne bi tenê nameyek, gelek name nivîsîn, lê wî tu bersiv wernegirtin. Wî ji nas, heval û dostên xwe yên Stembolê jî alîkarî xwest- ibû ko ew şopa Cananê hildin. Lê Canan winda bû. Ew hew diçû xwen- degehê, hew li mala bavê bû, hew li wan cîhên nas bû. Ew nîn bû, lê gotinli serê gelek bûn; hinan digotin ko wê daye pey zabitekî tirk û pê re çye Ankarê, navenda rejîma nû ya Tirkîyê. Hinan digotin, ew bi yekî boşnak re zewiciye û bi hev re çne Saraybosnayê. Li gora hin xeberên din jî, ji bo xwendina bilind, ew çbû Parîsê. Bêxeber û şop, wê xwe winda kiribû... Celadetê ko pirî caran bi xewnên Cananê ji şevên sar ên Munîxê hişyar dibû, dikir, nedikir, nikarîbû riya ko diç nik yara şevên spî yên

Stembolê, bidîta.

Bîhtengî ne bi tenê ev bûn, heta qirikê ez ketibû m nav bîhtengiya derd û keseran. Ez kotî bûbûm... Di wê gera me ya welêt de ko êdî jîn û qedera min xistibû ser riyê nû; vegera mala germ, ocaxa hebûn û jînê li minqedexê kiribû, rojekê, li gundekî Kilîsê ko em jê dibihurîn, pîrejinekê, li ser halê kurdan weha gotibû; Ce keran şamî dike, mesqel şûran misrî dike, xizanî mêran kotî dike. Bi qewlê vê jina porspî ya dûrbîn, xizaniyê ez kotî kiribûm... Bila yeqîna te ji Xwedê hebe, min ew oda çargavî jî, bi hezar zehmetî peyd a kir û bi hezar zehmetî heq ê wê dida. Tunebûn û wind - ab ûnê dor li min girtibû û roj bi roj cîh li min tengtir dikir. Ez, derketiyê welêt, roj bi roj diketim, dibûm ko tî û ketî. Rewş ewçend xirab bûbû ko min êd î nikarîbû cixare jî peyda bikiriya. Min cixare dijmartin û dikêşandin. Kêşana cixarekê bûbû kêfxweşî û serfiraziya herî mezin. Di wan rojan de, tiştê ko herî zêde min dix west, wexwarin bû, vexwarina araqê. Lê ew jî bi dest nediket.

Min dixwest vexwara, heta serxweş bûma, her tiş tî ji bîr bikira, vexwara.

140

Ew rojên me yê peşîn ên Munîxê, rojên xwarin û vexwarin, konser û restoranan, bûbûn xewneke mijdar. Wê şeva ko ez heta sibê rûniştim, min şûşeyêke şarabeke nexweş a sor peyda kiribû. Heta sibê, min e w hêdî hêdî, dilop bi dilop, vexwar. Lê min tu tişt ji bîr nekirin, ji bervajiyê, tiştên

nexweş ko min ji bîr kiribûn, hatin bîra min. şarabê ez ji derd û keseran riz-

gar nekiribûm, bîlakîs, ez kiribûm girtî û dîlê wan.

Min hal û hewalê xwe yê zîz, roj bi roj, carina bi kitekitan, derbasî wê

deftera ko Cananê dabû min, dikir. Ew çend rêzên biçk ên wê defterê têra salixdana wan rojên dûjehê dikirin.

Min debara xwe bi çi fikir? Min hin bendên biçk dinivîsîn, carina heftê

saetek-du saetan dersên zimanê kurdî û tirkî d idan, tevî Kamuran, ji Stembo lê mehfûr û xalîe didan anîn û ew difirotin. Ez ro jnamevan bûm, dilê min pê re bû û li Alemanyayê tê de, herç ne zêde bû jî, qezenc hebû. Ji bo kovar û rojnameyên alemanî, min carina li ser çîrokên Mele Nesredîn, tarîxa kurdan, edet û ûsilên wan ên kev n, neçîr û nêîrvaniya wan, bendindinîvîsîn.

Li vir ez serpêhatiyeyeke xwe jî bibêjim; di wan rojan de, carekê, ez bûm

milyoner jî. Na, ne milyoner, milyarder. Na, ne milyarder jî, bilyoner... Saadet Abla û nasekî min ê din çend dolar ji min re şandibûn û piştî xe- bateke dijwar, min ew dolar wergirtibûn û qulipandibûn ser markê. û ew çend dolarên min bûbûn çend bilyon! Ez bûbûm bilyoner, lê bilyonerekî neçar û xizan!

Deriyê oda Celadet, bi hêdîka, du caran, lêdikeve. Kî ye? Di vê destê sibê de, kî tê oda wî? Safter? Kamuran? Monika? Ew derî vedike. Hevalekî wî

yê aleman, di destan de rojnameyekê, bi heyecan, li ber derî rawestayê. Hevalê wî dibêje, »gotten morgen«, rojnama destê xwe dide Celadet û derbasî hundir dibe. Celadet li rojnamê dinihêre. Xebereke tarîxî, bi tîpên germenî, nivê rûpelê dagirtiye; Hîtler hikumeta alemanî

hilweşandiye û hikumeteke nû ya neteweyî ava kiriye. Celadet, bi heye-

can, xeberê dixwîne. Hitler, demançe di destan de, alîgirên wî li pey, bi darê zorê, meclîs û hikumet têk biriye û desthilatiya xwe îlan kiriye.

Alemanya dikele. Celadet û hevalê wî ji odê derdikevin. Di rojeke weha de Celadet ê di

oda teng de çi bike? Celadet dere unîwersîtê. Unîwersîte dikele, xwende-

van di nav heyecaneke bêpayan de ne. Ders rawestane, mamosta neha - tine, yan jî nexuyane. Celadet li wir Kamuran, birayê xwe yê şoreşger,

141

dibîne. Kamuran tevî xwendevanan bûye, bi heyecan ji Celadet re, behsa serhildan û guherînên nû dike. Herdu bira ji xwendegehê derin Kahnihall-ê, warê şêniyan. Kahnihall jî mîna xwendegehê dikele. Ew li wir Safter, bi tesadufî, dibînin. Di rojê weha de wî xwe ranegirtiye û

daketiye bajêr. Hersê bira, bi du bisiklêtan, Celadet û Safter li ser bisiklê- ta Safter, Kamuran jî li ya xwe, li bajêr digerin. Tarîx li ber çavên wan tê

nivîsîn, rûpeleke nû ya tarîxî li nik wan dest pê dike. Ew, zarokên ser- hildanan, naxwazin rû ji şahîdiya tarîxê badin. Bi qasî çend saetan ew li

bajêr, bi hev re, digerin, paşê tîna oda Celadet. Ji gotin û xeberdanê bêtir,

ew rojnaman dixwînin da ko rûdana bûyeran baş têbigihên. Piştî nîvro yê, Kamuran û Safter derin. Celadet jî deftera xwe ya biçk vedike û bûyerên danê sibê dinivîse. Lê bûyer neqediyane, ji bervajiyê nû dest pê

dikin. Ew hê bi rêzên pir basîd bûyeran dinivîse, hevaleyê wî yê din tê. Hevalê wî yê aleman bi heyecaneke mezin û kelgirî dibêje;

- »das blut... blut... xwîn diherike, li Odeonplatzê xwîn diherike...«

Celadet ko li ser xwarina xwe ya kartolan e, bi carekê radibe û berê xwe

dide Odeonplatzê. Dor li Odeonplatzê hatiye girtin. Li hin aliyên mey-

danê kuştî li erdê dirêj bûne, li serê her kuçeyê otomo bîlên eskerî yên bi

zîrx û mîtralyoz li hêzên Hîtler didin. Ordiya ko bi dewlet û hikumeta Alemanyayê girêdayîye, serhildana tevgera nazîstan dişkîne. Adolf Hîtler

û hevalên wî li ber xwe didin, lê wan şikestên xedar xwarine, ew mîna pelên payizê ji hev dikevin û hildiweşin. Teqîn e, Odeonplatz bi dengê çek, mîtralyoz û topan olan dide. Dûman û bîhna barûdê ji meydên radibe.

Celadet li kêleka koşeyeke kolaneke teng radiweste û li meydên û xaniyên doralî dinihêre. Tevgerike bo ş a mirin û kuştinê, bi dengên boş,

dor li meydên girtiye. Bi qasî pêncî mîtro ji Celadet dûr, li ber devê koşeyekê, eskerekî, b i qîrîn, hildiweşe û dikeve. Esker li erdê xwe dilivîne.

Kes naçe ser wî. Ji xaniyê jor ê li ser kolana Celadet dengê musîkeke klasîk, pir bilind, tê. Di nav hemû dangan de, Celadet guh dibe ser dengê

musîkê jî.

5

Di nav dengên nalîn û şehwetê de, Celadet guh dibe ser dengê musîka klasîk a Gustave Mahler jî. Dengê musîka Mahler, bedew, bi dûzan û awazeke xweş, hêdî hêdî, bilind dibe.

Hemû deng,

hemû awaz, hemû aletên musîkê, di nav ahengeke pir xweş lihevhatî de

142

1. Hemû bi hev re musîkeke bêpayan tînin pê ko heş dike sermest, dil dike aram.

Celadet bi hêdîka çavên xwe vedike û li çavên mezin ên Monikayê dini-

hêre. çavên wê, kahniya hez û hezkirinê, mîna du stêrkan dibiriqin.

çav mîna zeryayekê ko bi tîrêjên tavê dibiriqe, ewçend boş û xweş dikenin.

Di çavên Monikayê de kahniya heyecanê, zerya hezkirinê dixuyin. Celadet, bi germahiya ruh û dilê agir pêketî, bi kûrahiya heyecana hezê,

li sîng û berê ciwan, porê zer, çavên zerya û lêvên xurme dinihêre.

– Paseratta mia, mia... Celadet bi nalîn dibêje. Monika bêdeng dikene, xwe li ser Celadet xwar dike û lêvên wî dixê nav lêvên xwe. Agir bi lêvan dikeve, agirê ko bi lêvan dikeve, xwe pêl bi pêl, bi hemû bed enê digihîne. Dilê Celadet ê agir pê ketiye, niha diçirûse, jê çirûsk difirin. Bedena Monika ya germ û nerm Celadet radipê, vedi -  
gire. Agir ji bedena Celadet radibe. Monika tiliyên herdu destên xwe, pêhit, dixê nav tiliyên Celadet û wan diguvişîne. Monika, jina bexçê evînê, yara coşên bilind, dixwaze herdu bedenên bike yek, hilm, bîhn, deng û pejnên bedenên bi hev ve girêbide.  
Tîrêjên tava danê êvarê yê mor ji serê çiyayên Alpê xwe digihînin oda wan. Ode di nav ronahiyeke sor de ye. Pencera odê heta dawiyê vekiriye û bayekî sivik ê paqij tevî germahiya odê dibe. Monika û Celadet, ji bo hefteyekê, hatine gundekî tenha, sakîn a Swîsê ko di nav gelî, lehî, dahl, gol û çiyên de ye; Sils Maria. Dinya germ, heyam havîn e. Lê hawa paqij a zozanan hênik e. Monika ko felsefe xwendiyê û li ser rîya feylesofiyê ye, Celadet jî wergirtiye û bi hev re hatine warê filîzofekî mezin; Friedrich Nietzsche. Monika ko hemû berhemên Nietzsche xetim kirine, ne bi tenê li pey bîr û dîtinên wî ye, lê ew ketiye pey şopên jiyana wî jî. Niha ew hatine gundê biçk ko Nietzsche havînan dihatê. Wan odeyek li maleke pensiun private ko piştî xwe daye çiyên û xwendiyê bexçeyekî xweş û bîreke lêkirî ye, kirê kirine û rojên x we, ji bilî xwend in berhemên Nietzsche, guhdarîkirina musîka Mahler û yekkirina bedenên, bi gera nav dar û daristan, dahl û newal, gol û çeman ko Nietzsche car bi car zi-

yaret kiribûn, derbas dikin.

Me dabû pey şopa Nietzsche, hem bi bîr û bawerî hem bi can û dil. Nietzsche, nivîskar û feylesofê siûdxirab û keserkûr, piştî salên dirêj ên bê- deng û tarî, di destpêka salên 20-an de, bi carekê, bûbû stêrka esmanênfilîsofiyê û çirûska heviyê ko meriv li peyê bûn. Nietzsche, xwediye bede-

143

na ecêb jar û fikra ecêb xurt, mîna gelek kesên din, pir tesîr li min jî kir. Hergotinekî wî mîna lehiyekî gur, her dengê wî yê ko ji nav rûpelan bilind dibû, mîna newaleke kûr, her fikreke wî mîna çiyayên Alpê bilind bû. Nietzsche, qedera wî ya keserkûr, tenêtiya wî ya bêpayan, derketî û ketîbûna wî ya bêtaswîr, armanc û hedefên wî yên bilind, pir bilind, li min û qedera min dihat. Mîna gelek kesên din, min jî digot; Nietzsche ji bo min, qedera min, welat û gelê min nivisiye. Wî »Ecce homo«, » Also sprach Zarathustra« û eserên xwe yên din ji bo min, bi tenê ji bo min nivîsîbûn. Ma gotina Nietzsche ya fransîzî ko wî her digot, décadent, ketî, ne gotina umrê min û qedera miletê min bû? Ma rûpelên »Also sprach Zarathustra« ez nedigîhandim reh û rêçên min ên windabûyî? Ma gotinên wî huwiyeta min a piralî, ruhê min ê peregende nedidan ber zompan?

Nietzsche ez bûm, ez Nietzsche bûm... çaxa rûpelên wî, tevî musîka Mahler, ez dibirim serê çiyayên cîhana wî ya taybetî, rengîn û dîn, ez weha difikirîm.

Mahler, musîka Mahler, pêwendiya dengê musîkê û dengê ruh û dil jî

dîsan, bi xêra Nietzsche, bûn pardarên jîna min. Mahler, heval û hostayê Nietzsche, dijmin û vajiyê wî, ruhê min ê pêldar, bi saya Nietzsche, hînîaramî û ahengê kir. Her çawan tiliyên min ên qelaw û bipirç piştî nerm a mîna masiyan difirkand, musîka Mahler jî ruhê min difirkand.

Ez, neviyê Mîr Bedirxan, şagirtê Ovidius, xwendevanê edebiyat û



medeniyeta fransizî, hîn dibûm, min dîsan dest bi şagirtiyê kiribû; ez hînî ketî û kotîb ûnê, neçarî û xizaniyê, ru hê daketî û şikestî yê alemanî, bedena nerm a genimî û daristanên wê yên şil û zer, felsefe û edebiyata comerd a germenî dibûm. Ne bi tenê Nietzsche, tevî wî, min Goethe û Bîsmark jî dixwendin. Nietzsche, Goethe û Bîsmark di wan rojan de, ji her tiştî bêtir, ji her kesî zêdetir, dibûn alîgirê min, dibûn dermanê ruhê min ê birîndar. Gotinên Nietzsche mîna şûrê ji kalanan kişiyayî, bi hêz, bi dîsîplin, her bi xof û hilawestî bû. Gotinên Goethe, yên mîna »uns umspülen hund ert- tausend wogen, alles reizt uns, mancherleri gefaellt«, mîna hewreşîma herî nerm û tenik, bi stranên bedew ên xewnan, dilê min difirkandin. Heçî gotinên bîranîn û tecrubên Bîsmark bûn, wan ez dibirîm nik bapîrê min, mîrê welatê bav û kalan, mîrê welatê min ê xewnan. Min hersê jî diviyan. Hersiyar jî ruhê min ê şerpeze dicebirandin.

- Fürst, mein fürst, Monika, bi nalîn, dibêje.

Mûyên simbilê Celadet ên reş li ser mûyên tenik ên Monika yên zer, gi-

144

ran giran, digerin. Bedena Monika ko bi bîhna hez û xwîdanê, bi hêdîka,

dilive, xwe, bi hemû comerdîya xwe, teslîmî tiliyên girs û mûyên sert dike. Li gora simbêl û lêvan, beden radibe û dadikeve, mîna ko beden jî

guh dide musîkê û bi ahenga wê xwe dilivîne.

- Av, dikarî hinekî av bidî min, ez tî bûm, Monika dibêje.

Piştî bîhnekê, Celadet xwe ji bedena nerm dide alî, ji ser cîhan radibe û

ber bi masa biçk ko li kêleka pencerê rawestayê, dere. Stîleke biçk tijî av ko Celadet ji bîra bexç kişandiye û tasek li ser masê ye. Celadet dere ber pencerê, hinekî rûyê xwe ber bi Monika ko serrû dirêj bûye, dizivirîne û li wê û bedena wê dinihêre. Bi qasî kêliyekê, ew welê lê di nihêre, bi dû

re, ji pencera vekirî, li bexçê, bîrê û çiyayên bilind ên hember dinihêre. Bayekî henik rû, sîng û xwîdana ser pirçn sînga wî mist dide.

6

Bayekî hûnik rûyê Celadet mist dide. Keştî bi hêdîka xwe dilivîne û bi rê dikeve. Celadet, cara dawîn, li ser keştiyê, li Trieste-yê, ba- jarê îtalî, bajarê dawîn ê Awrûpayê dinihêre. Celadet, tevî biraziyê

xwe, lawê kekê wî Sureya, Heqî, Awrûpa terk dike û dere Misirê, nik kekê xwe, bav û diya xwe, nik xwişka xwe ya dengşalûr.

– Bi xatirê te Awrûpa, Celadet dibêje, ji bo vê car ê evçend xizanî têr dike. Yezdanê pak ji careke din re kerîm e... heta careke din, di xweşiyê de bimîne.

22 -ê gulana 1925-an e. Bi qasî sê salên Celadet li vî

îro, rojeke xweş ,

aliyê dinê derbas bûn. Niha ew rûyê xwe did e aliyekî din ê dinê. Ev aliyê

dinê, Awrûpa, mîna hêlekaneke bêserî, di nav aloziyan de dere û tê. Awrûpa avis e, guherînên nû dê, li her alî, biqewimin. Li Alemanyayê

Hitler û hevalbendên wî şikesteke mezin xwarin, lê ew ji nû ve xwe didin hev da ko hikum bi dest xînin. Li aliyên din ên Awrûpayê jî tevgerên we- ha, roj bi roj. xurttir dibin. Ev alî weha, lê aliyê dinê ko Celadet niha ber bê dere? Hema çî bigire, Celadet tiştêkî nizane. Digel ko ew berê jî çûbû Misirê, haya wî ji guherînên dawîn ên Misirê nîn e. Wî esas d il hebû, mî-

na birayê xwe Tewfîk, vegeriya Stembolê, bajarê xwe yê qedîm ko her xewnên wî dineqîşandin. Lê veger îro ne mumkin bû. Jê re, ji Stembolê weha nivîsîbûn; vegera te, mirina te ye. Loma ew niha berê xwe dide

aliyekî din ê dinê. Lê wî pir bêriya bav û diya xwe yên pîr jî kiriye.

Kekê

wî Sureya di nama xwe ya dawîn de jê re behsa nexweşiya bavê wî jî kiribû. Nexweşiya ko Sureya Beg bi »intérmatterce parsuit d-arteras

chloro se origine cardiaque« bi nav dikir, roj bi roj, xirabtir dibû. Celadet

145

dixwest bavê xwe bibîne, li kêleka wî rûne, li rîh û rûyê wî binihêre, li dengê wî yê kûr û gotinên wî yên kîbar guhdarî bike.

Dinya ronî û germ e. Rojê çavên xwe vekirine, ro bi qasî çend bihustan

hilhatiye. Celadet serê xwe hinekî radike û li bajêr dinihêre; xaniyên reş û boz li pişta hev siwar bû ne, esman bi keskahiyeke vekirî çend ewrên spî

hembêz kirine û bi nazdarî li jêr dinihêre.

– Ewrûpa, bi xatirê te, Celadet dîsan dibêje.

Hevalên rê yên Celadet û Heqî, hema çî bigire, hemû cihû ne. Cihûyên

Rûsyayê ko koç dikin û derin Filistînê.

Em rêwîyên bêwar û welat, ketî û derketiyên cîhanê, kurd û cihû, di keştiyekê de gihîştibû n hev. Ez ji welatê xwe yê xewnan hinekî din bi dûr diketim, ew ber bi welatê xwe yê xewnan diçin. Ew ji Rûsyayê dihatin, li Warşowayê, Yekitiya Derketiyên Cihûyan ew werdigirtin û bi 2.5 lîrayê îngilizî, bi keştî, ew dişandin Filistînê. Cihûyan ji ders û tecrubên xwe derdixistin ko cîhan dîsan li wan teng dibû. Ew li pey stariyekê, warekî bi huzûr û axake rehmetê bûn.

Heçî ez bûm, mîna pêlên ko keştiya me li pey xwe danîn pê, ber bi jor û

ber bi jêr bûm. Ji bo roj û dewrên bê, ne fikreke min, ne jî zanîneke min hebû. Gerç min plan û projeyên siyasî, çandî û edebî hebûn. Lê kengî, li kû çawan?.. Min bi van yekan nizanîbû. Ewrûpa ko ez jê gelek tiştên nû hîn bûm, êdî li pey min dima. Ewrûpayê ez fêrî tenêtiyê û birçbûnê kirim. Ez ko ji bo her tiştî, her, hewcedarê kesan û tiştan bûm, bi xêra Ewrûpayê, fêrî xweseriyê bûm. Min êdî

bi xwe dikarîbû qîma xwe bi xwe bianiya. Ez hew hewced arê qerwaş û berdestan bûm, hew li pey xizmet û xizmetkaran bûm. Ez fêrî ders û tecrubên germenî, rabûn û rûniştina wan, edet û ûsilên wan bûm. Li edet û ûsilên kevn ên kurdî, mîr û mîrîtî, osmanî, bîr û baw- eriyên şoreşgerî yên fransizî, Rousseau, Voltaire, Diderot, yên alemanîzêde bûn.

Lê di wê roja xwe ş a gulanê de, bayê fele kê ez ber bi deverên din dibir-

1. Heqî, biraziyê min ê ko pir li bavê xwe dişibû, bi min re bû. Ew ji bo xwendinê hatibû Alemanyayê. Lê xwendin êdî ji Alemanyayê bi dûr ketibû. Safter, roniya çavên min, Pelikan, Monika ko min jê re şîrên Omer Xeyam û çrokên şehrezad a Hezar û şevekê bi fransizî dixwendin, oda min a biçk a tarî û bêhawa, kartolên min ên çelmisî, şûşeyên vala yên bîrayên Bayernê, qelûn û xwelîdanka min, derpiyên min ên pînekirî, êdî li pey diman... Lê min deftera biçk a yadîgara yara Stembolê ko winda

146

bûbû, dîsan, xistibû bêrika xwe, ew bi min re bû.

Cihûyên ko b ûbû n hevriyên me, merivên neçar, bêdeng û bi terbiye

bûn. Gava ew hîn bûn ko em kurd bûn, gelekî kêfa wan hat. Wan gelekîqedrê me girtin. Lê tiştê ko herî zêde bala min kişand, daxwaza wan a zi- manê hebrî bû. Wan bi vî zimanê ko zimanê wan ê rojên bê, hêviyên wan bû, nizanîbûn. Lê daxwaza wan a hînbûnê bêsinor bû. Heta em gihîştin Misirê, wan her, bi deng, ma mosteyekî li ser wan, xwendin. Wan digot, »zi- man ruhê me cihûyan e.« Vê yekê gelekî tesîr li min kir. û gava min Hawar weşand, di hejmarekê de, min serpêhatiya cihûyan û zimanê wan nivisî û ew yek ji bo kurdan ko ji zimanê xwe bi dûr diketin, mîna mîsaleke baş pêşkeş kir.

– Bavo dê li îstasyona trêne ya Kahîrê li hêviya me be, Heqî dibêje. Celadet ji berîka xwe deftera xwe ya biçk derdixe û berî ko ew li ser

kursiyê rûne, bi dengekî pir nizm ko bi zehmetî seh dibe, bersiva  
Heqî  
dide,

– Ez dixwazim, em zû, zûtirîn wext, bigihên Misirê. Min bêrî kiriye,  
bêriya bavê te, bapîrê te, dapîra te, meta te kiriye...

147

148

FOTOGRAF 9: Xoybûn... hebûn, heyî, heyîtî xwe-  
bûn, xweyî, xweyîtî...

1

Fotografê nehan a romana ji welêt û Stembolê dûr, li welatê  
Mixribê, Misirê, tê kişandin. Ev fotografê hanê, di eynî wext-  
tê de, fotografê dawîn a Emîn Alî Beg û bermaliya wî Samîha  
Xanimê ye. Di pey vê fotografê re, ew hew di fotografên de dixuyin.  
Fotografên ko rû û rûikan dikin nemir, hew dikarin wan  
ve- biguhezînin dewr û dewranên bê. Ji ber ko fotograf rû û rûikên  
jîndar

dikin nemir...

Ev fotograf li mala Sureya Beg, kurê Emîn Alî Beg û kekê Celadet, tê  
ki şandin. Sureya Beg ko ji mêj ve ye li Misirê dijî, li gundekî  
Kahîrê, Zeytûniyê cîwar bûye. Zeytûnî, gundê dewleme nd,  
xwedîmal û xwedî-

navan e. Kesên navdar û xwedîpirsiyariyên mezin xwe ji teşqele û  
xireci-

ra rojane ya bajarê mezin Kahîrê dane alî û hatine li vî gundî  
dijîn. Gundekî basîd ê ereb qulipiye ser wargehekî girîng ê siyaseta,  
çand û

aboriyê.

Piştî ko Emîn Alî Beg, tevî jin û keça xwe, hatiye Misirê, ew li mala  
Sureya Beg dijîn. Mala Sureya Beg xaniyekî kevn ê mezin e. Ew ne  
bi temamî qesr e, lê jê ne zêde bi dûr e jî. çav û odayên xênî  
bêhejmar in.

Bexçeyekî fireh û dirêj ko hertim bi rengê kesk û hêşîn, bi ber û fêkî ye, bi xweşiya xwe jiyana aram a gund û malê direngîne. Sureya Beg, jina wî ko ji malbateke mezin e û keça begzadeyekî navdar ê Misirê ye, lawê wanHeqî û keça wan Kudret, ji zû ve ye, li vê mala mezin dijîn. Emîn Alî Beg,

Samîha Xanim û Meziyet jî, ji çend salan û vir ve ye, bûne pardarên jiyana mala mezin û gundê xweş.

Ev fotograf li ser daxwaza Meziyetê tê kişandin. Meziyet ko êdî bûye keçeke xama, fotografên mal û malbatê dicivîne. Gava ew hê li Stembolê bû, wê li Kadikoyê, ji atolja Mr. Xandemian, deftereke ren gîn û neqîşî yê wêne û resiman kirîbû û fotografên bav, dê, bira, ap, met, pismam û dotmamên xwe têdixistê. Wê ji fotografan, germahiya ko ji kaxizên sar di-

149

reşyan, hez dikir. Bi alîkariya defterê, ew her li ko bûya jî, nas û nêzên wê li nik wê bûn. Wê hertim defter vedikir û li sûretên bêzar, bêdeng dini- hêrîn. Deftera bêziman bûbû zimanê jiyana û bîranînên wê. Bi taybetî ni-

ha, li welatekî ji Stembol û Kadikoyê gelekî bi dûr, tevî Kudretê, albuma

wê bûbû hevala wê ya nêzîktirîn. Meziyetê, di rûpela yekemîn a defterê

de, rêzeke bavê xwe, bi tîpên xweş û neqîşkirî nivîsîbû; dewra felekê li ser

me kîn e... Wê gotina bav û kalan, nîşana umrên bêmiraz û derketî dubare dikir.

Li gundê Zeytûnî jî, wê ji bavê kal û diya pîr her dixwest ko ew bi hev

re xwe bidin ber kameraya wênan. Li ser daxwaza Meziyetê, Sureya Begji Kahîrê fotografkêşekî hoste daye anîn û ew li malê foto grafên malê dik -

işîne. Fotografkêş çend dêmenên malbatê, bi hev re, kişandine. Niha jî ew di vê fotografa nehan a de, ya Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyetê dikişîne.

Belê, li ser vê wênê ko li salona mala Sureya Beg tê kişandin, ew hersê

hene; Emîn Alî Beg û Samîha Xanim rûniştî, Meziyet jî li pey wan, li piyan. Ji lixwekirinên wan dixuye ko dinya sar e. Paltoyekî reş ê dirêj li ser Emîn Alî Beg e. Samîha Xanim jî di nav cil û bergên germ ên reş de ye. Meziyet ko bejna wê ne ewçend dirêj e, mantoyeke reş li xwe kiriye. Wê serê xwe bi tûleke reş girtiye. Samîha Xanimê jî bi dolbendekî reş. Li ser serê Emîn Alî Beg jî fesekî reş ê Osmanî heye. Digel ko wan welat, dewr û dewran guherîne, cil û bergên wan mîna berê, mîna yên Stembolê ne. Ne bi tenê lixwekirin, lê awir, rûniştin û nêrîna Emîn Alî Beg û Samîha Xanimê jî her mîna xwe ye. Di hemû fotografan de, ew bi eynî celeb awir û nerînê li kamerayê mêze dikin, bi eynî celeb rûniştinê rûdinin. Lê hin aliyên taybetî yên vê foto grafê jî hene. Ew aliyên ko vê fotografê ji yên dinvediqetîne, meriv dikare bibêje, ev in; west û keser, digel her hewldan û dilkirinê, west û kesera ko dixuye. Hem Emîn Alî Beg hem jî Samîha Xanim westiyayî, pir westiyayî dixuyin. Emîn Alî Beg, mîna her carî, serê xwe hinekî b ilind kiriye, herdu destên xwe danîne ser çogên xwe û bi gi- ramî li çavika kamerayê dinihêre. Rî û simbêlê wî çikspî ne. Tevî ko ew hewl dide bi xurtî binihêre, lê nerîna wî giran e, çirûska nerînê vemiriye.

çavên wî bi zehmetî vebûne, ew bi zehmetî dinihêre. Samîha Xanim jî hewl dide da ko şên û bi ken li kamerayê binihêre. Lê ew jî nikare west û kesera li ser rû û çavan in, veşêre.

Nabe. Ew nikarin şopên umrên kal û serencamên keserkûr ji nerînê awirên

150

xwe bi dûr xînin. çav dipeyivin, kesera ko hatiye û li ser bîbikan veniştîye her tiştî dibêjin. Hewce bi gotin û salixdanan nîn e. çavên

ko ji nav kaxiza zerbûyî li pêşiyê, kamarayê dinihêrin, jixwe, hal û hewalê dibêjin.

çavên wêneya nehan a romana Bîra Qederê; şahîdên jiyanên peregende, stranên welatê xerîbiyê, nerîna umrên sirgûn, şîn û taziyên bêrawest, hes- reta b êrawest, lorînên dirêj ên şevên reş ko her û her ji welatê bav û kalan bi dûr bihurîne...

Ma meriv dikare çi bibêje? Li cîhê ko çav bipeyivin, gotin xelas dibin.  
2

Ma meriv dikare çi bibêje? Li cîhê ko çav dipeyivin, gotin xelas dib- in. Celadet li çavên bavê xwe dinihêre. çavên Emîn Alî Beg ketine

kortê, helqeyên li dora çavan zêde û kûrtir bûne. Fera çavan vemiriye.

– Kurê min, Emîn Alî Beg dibêje, her destpêkekê kutahiyekê, her um-

rekî mirinekê heye. Ev, rastiya jîn û cîhanê ye ko tu kes nikare biguher-

ine. Ez jî nikarim...

Emîn Alî Beg bîskekê radiweste, çavên xwe ji Celadet dizivîrîne, li kulîlkên nûbişkovî yên kêleka bîrê dinihêre û bi kurdiya xwe ya kîbar û

nerm gotina xwe didomîne.

– Em ji ko hatin ku! Bala xwe bidiyê, Ez li welatê xerîbiyê hatim dinê.

Tu li welatê xerîbiyê hatî dinê. Niha jî me ji welatê xerîbiyê koç kiriye û em hatine welatekî hîn xerîb... di dawiya umrê xwe de, ez ji welatê bav û

kalên xwe hinekî din jî bi dûr ketim. Min nedît, lê rehma Xwedê li wan be, Yadê Rûşen, Amojna Sitî, mamên te Tellî û Elî şamil Paşa behs

dikirin. Gotineke Mîr Bedirxan, kalikê te yê rehmetî, hebûye. Ji roja ko



osmaniyan ew birine Girîtê û heta mirinê, wî hertim ew gotin dubare kiriye. Wî hertim gotiye; xerîbî ne tu çek e, piyê xwe tê re meke... Lê

hezar heyf ko çekê xerîbiyê bû kincên me, cil û bergên me. Xwedê şahîd e, min her xwest ko ez vî çekê kamb ax ji xwe û ji zarokên xwe bikim û bi

qasî bihustekê be jî, axa bav û kalan bi dest xînim. Lê nebû... Helbet te şîret navên, lê belê gotina kalikê xwe ji bîr meke...

Emîn Alî Beg dîsan radiweste, li Celadet û Samîha Xanimê dinihêre. Samîha Xanim ko li kêleka wî rûniştiye, ji masa biçûk a li ber wan perçeyekî biçê portakaleke qaşkirî digire û dide Emîn Alî Beg. Ew

purtaqalê werdigire û bi hêdîka dixwe.

151

Bavo ji portakal û mandarînan hez dikir. Di wextên wan de, ew ji malê kêm nedibûn. Hebûna wan, qaşilandina wan, xwarina wan kêfeke malê bû.

Gava em zarok bûn, me ji destê Bavo portakal dixwarin. Lê li Misirê êdî wî

ji destê me ew werdigirtin û dixwarin. Bavo kal bûbû, bi gotina te, feraçavên Bavo vemirîbû.

Diya min a rêzdar û bêdeng, her roj, purtaqal û mandarînan diqaşilandin,

ew dixistin nav firaqên pahn ên neqîşkirî û danên êvaran, gava Bavo derdiket bexç malê û li kêleka bîrê rûd inişt, Dayê ew, yek bi yek, hêdî hêdî, didayê. Bavo ji malê d ervediket. Ew her li malê bû, dixwend dinîvisî û radiza. Mîna b erê ew nedipeyivî jî. Ew hertim di nav fikir û gumanan de bû. Lê gava kekê min Sureya jê re, carina, rojnamayên tirkî dianîn, hingî ew fera ko vemirîbû, d îsan vedigeriya û Bavo ew bi heyecan, rêz bi rêz, dixwendin. Ji wan rojnaman pê ve, Bavo hejmarên kevn ên kovara Kurdistan ko birayên wî Mîqdet û Evdirrehman li Misir û Awrûpayê derx - istibûn, dixwendin. Wî kitabên kevn ên tarîxî û yên li ser welatê

kurdan, mîrekiya Cizîra Botan dixwendin. Di wan rojên bi keser û di wî umrê kal de, Bavo, bi alîkariya kovar û k itaban, vegeyriyabû cîhana windabûyî ya zarok - tiya xwe, ya xewn û xeyalên xwe.

Bavo nexweş bû, dilê wî diguvişî. Wî kes nedidîtin, lê carina nas, dost û

ehlê me dihatin ziyareta wî. Eger dinya xweş bûya, ew li bexç, li kêleka bîrê rûdiniştin. Bavo ji bexçê û nemaze bîra bexçê pir hez dikir. Bîra bexçê kekê min Sureya bîra mala me ya Kadikoyê dihanî bîra wî...

Bavo li bexç, li kêleka bîrê rûd inişt û purtaqal dixwarin.

Bexçe hêşîn dike, gul û kulîlk dibişkivin. Meziyet û Kudret av dane wan.

Di vî danê êvarê de bîhneke xweş ji bexçê difûre.

– Kurê min, Emîn Alî Beg, dîsan bi hêdîka û bi kurdiya xwe ya paqij, dibêje. Em dawacî ne. Bi neheqî axa me, mal û mulkên me, ji me hatine standin. Em ne mîrên kesekî din, lê mîrên erd û axa xwe bûn.

Em doza

axa xwe dikin. Rehma Xwedê lê be, umrê kalikê te, gelek mamên te li ser riya vê dozê borî. Ew îro, her yek li derek î, peregende, di bin axa sar de,

çavvekirî, dinivin. Qebr û gorên wan jî li welatên xerîb in. Ji ber bê- gaviyan, em îro nikarin herin qebrên wan jî ziyaret bikin. Ji te û birayên te, bi tenê, du daxwazên min hene. Yek; hûn jî, mîna bav, kal û mamên

xwe dawacî bin, bi îlim û îrfan li ser riya dawê û dozê bin. Ro yê nîkîk lê herikî ji avên mezin lê sekinî her çtir in. Dudo; eger we rojekê bihusteke

152

axa bav û kalan bi dest xist, min ji bîr mekin, hestiyên min bibin û nêzîkê qesra bav û kalan, Birca Belek, li kêleka çemê Dijlê, min veşêrin. Şitileke dara çinarê jî li ber serê min biçnin... Daxwaza min, hesreta min, bi tenê ev e.

Emîn Alî Beg, dîsan, çavên xwe direvîne. Celadet deng nake, tu bersivê nade. Ji çavên Celadet çend hêstir, bi hêdîka, ber bi jêr dibin. Samîha Xanim jî digirî. Samîha Xanim dixwaze libeke purtaqalê din bide Emîn Alî Beg, lê ew naxwaze. Ew, bi nerîneke zîz, li kulîlkan dinihêre. Bêyî koew nerîna xwe ji ser kulîlkan bizivirîne, mîna ko ji ber xwe bipeyive, ew dibêje;

– Xwedê alîkarê we be, kurê min. îşê we çetin, riya we dirêj e... Celadet, çavşil, lê dinihêre, bêyî ko tiştêkî bibêje yan jî bike, bi tenê lê dinihêre.

3

Celadet lê dinihêre. Hevalê wî yê Stembolê, dostê wî yê şevên Pera û Galatayê, Memduh Selîm Beg her mîna xwe ye. Tu guherîn li ser rû û rûikên wî naxuyin.

– Mîrê min, tu neguheriyî, Memduh Selîm Beg bi ken dibêje.

– Min ê jî eynî tişt ji bo te bigota, Memduh Beg. Piştî çar salan, di rojêke vekirî û zelal a Lubnanê de, herdu dostên kevn

li salona oteleke mezin a Beyrûdê hevûdu dibînin. Ji navberê çar sal bi-

hurîne. aar salên gelekî girîng û bûyertijî ko gelekî tesîr li herduyan jî

kiriye. Herdu li kêleka pencera fireh û dirêj a salonê, li ser kursiyên çer-

mîn, li hember hevûdu, rûniştine. Ji der, tirêjên tava ko li ser deryayê

rawestayê û hêdî hêdî diçe ava, di pencerê re, xwe bi coş digihînin hundir.

Dinya germ e. Pencerên salonê li derya dinihêrin. Derya bi şinahiyeke

vekirî, heta û heta, dibiriqe.

– Celadet Beg, ma kê dizanîbû ko me dê li vir hevûdu bidîta! – Jîn, Memduh Beg, jîn... Ma te bi xwe navê kovara xwe ya Stembolê

nekiribû Jîn?.. Jînê em avêtin van deran, em ketin ber pêlên xurbetê, bi

qewlê dengbêjên me, felekê kumê xwe li serê me xwar kir, Memduh Beg.

Garsonekî, di nav siniyeke spî yê zîvîn de, du qedeh û vexwarina ko wan xwestiye, tîne, qedehan heta nîvî tijî dike û dere.

– Celadet Beg, min dil kir em hevûdudîtina xwe bi qedeheke şampanya pîroz bikin, bi vê qedehê dest bi êvara xwe bikin. şampanya li vir

hem xweş e hem ji avê erzantir e. Ev şûşe bi deh frankan e, yanê bi pênce, şêş t qurîşên Osmanî. Loma min şampanya xwest. Ez hêvîdar im, ew ê bi

153

dilê te be...

– Bê şik.

– Mîrê min Celadet, min bêriya sohbetên me, rojên me yên Stembolê

kiribû... Em ê îşev, hemû şev, bi hev re bin. Xelîl Ramî Beg û Mewlanzade

Rifat Beg ê jî heta saetekê, saetek û nîvê werin. Tiştên ko em bipeyivin,

em bikin, pir in.

Tav û tîrêjên tavê hawirdor bi rengên mah şerê neqîşandibûn. Tav li ser deryayê, wî aliyê din ê aso , bi rengên jîndar û germ, diçû ava. Aso kiras diguherî. Ji kiraxên Beyrûdê, di salona otêlê de, ji jo r, me, min û dostê min, dostê bav û birayên min, Memduh Selîm Beg li guherîna rengan dinihêrî. Tîrêjên royê li ser rûyê me, bi germahî, digeriyan û rûyên me mist didan.

Memduh Beg ji Stembolê dost û nasê me bû. Ew jî yek ji serekên tevgera

kurdî, zane û têgihîştîyên civata kurdî bû, gerînend e û sernivîskarê kovara Jîn-ê bû. Wî jî, mîna me, ji bêgaviyê, dev ji Stembolê berdabû û nikarîbû vegeriya Tirkiyê. Rêber, ro nakbîr û zanayên

kurd ji hev ketibûn û li cîhanê belav bûbûn. Hinên wan li Awrûpayê bi cîh bûbûn, lê piraniya wan der- ketibûn Rohilata Navîn, welatên cîranên Tirkîyê. Gelekên wan li Lubnan, Sûriye û Antaq yayê ko di bin destê fransizan de bûn, dijiyan. Hinên wan jî çbûn Kurdistana Iraqê ko di bin destê îngilîzan de bû. Memduh Beg jî li Antaq yayê bi cîh bûbû. Rewşa wî jî mîna rewşa yên din bû; nebaş, belê nebaş... ma hewce ye meriv gotinê dirêj bike?

Rewşa min? Mîna ko feylesofekî gotibû; siwar ekî nezan û nehoste çawan li ser pişta

hespê rûdine, ez jî li ser pişta jînê welê rûniştibûm. Eger ez ji ser hespê jînê nediketim, ew ne ji hostehiya min, lê ji esaleta hesp bû... Di wan rojan de, min xwe gîhandibû Rohilata Navîn. Min serê hespê x we di wê axa germ a şewitî de berdabû. Hesp çargavî diçû, ji ber esaleta xwe, wî rê li ber xwe rast dikir.

Xelîl Ramî Beg û Mewlanzade Rifat Beg, herdu bi hev re, ji deriyê salo nê

dikevin hundir û ber bi Celadet û Memduh Beg tî. Pêşî Celadet wan dibîne, ew bi kêf radibe ser piyan. Memduh Beg jî pê re. Herdu, bi hev re, ber bi mêvanên nû derin. Celadet ko heyecana wî ji rû dixuyê, dere

rûyê Mewlanzade Rifat.

– Rifat Bey, üstad!..

– Býyyý

klarý

kesmişsin Celadet Bey!

154

Mewlanzade Rifat Beg wî ber bi xwe dikişîne û hembêz dike. Herdu, bi qasî kêliyekê, hevûdu, pihêt, hembêz dikin. Piştî çend salan, Celadet û Mewlanzade Rifat hevûdu, nû dibînin. Hemû bi hev re vedigerin cîhê

xwe, Celadet û Memduh Selîm Beg cîh nîşanî wan dikin û ew rûdinin.

– Belê, min simbêl jêkirin, lê min dil heyê dîsan berdim. Li van deran

bê simbêl hî nabe, Celadet dibêje û ji aliyekî ve jî, bi dest, bang garson dike.

– Lê weha jî li te hatiye. Tu ciwantir û çelengtir dixuyî. Tu çawan î? Min bihîst ko tu li mala Xelîl Ramî Beg dimînî. Sureya Beg, Kamuran Beg, ew çawan in? Min bihîst ko ew ê jî werin...

– Mala me dê şên be, mamê Celadet, Xelîl Ramî Beg dibêje. Jixwe ji ni-

ha ve Celadet mal şên kiriye, ew ê şêntir be.

– Mîrên min, hûn bi xêr hatin, Memduh Selîm Beg dibêje û bêyî ko li

bersiva wan bisekine, didomîne, piştî b i sedan zehmetî, me hevûdu dîsan

dît... tiştên ko em bipeyivin, em bikin, pir in. Em êdî zû bi zû dev ji hev

bernadin...

4

– Mîrên min, tiştên ko em bipeyivin, em bikin, pir in. Memduh Selîm Beg dibêje, em êdî zû bi zû dev ji hev bernadin...

Celadet Beg, birayên wî Sureya û Kamuran, mamê wî Xelîl Ramî Beg, hevalên wî û bavê wî Mewlanzade Rifat, Memduh Selîm, Dr. Mehmed

şukrî Segban, Haco Axa û hin kesên din li bajarê biçûk ê Lubnanê Cuniyê, li mala Xelîl Ramî Beg civiyane. Cuniye, bajarê biçûk ê file ko li

kêleka Beyrûdê ye, îro mazûbaniya rêber û ronakbîrên kurdan dike. Ronakbîrên kurd li hev civiyane û ew ê li ser rewşa kurdan û welatê wan bipeyivin. Li welêt her tişt tevîhev bûye; welat bi destên d ewletên biser- ketî perçe bûye, ji perç herî mezin ko li nav tixûbên dewleta nû, Tirkiyê

maye, dûman bilind dibe. Ew perçe di nav şewateke xedar de ye. Perç

Iraqê ketiye bin destê ingilîzan, ê îranê di bin destê farisan û yê Sûriyê jî di bin destê fransizan de ye. Xelkê westiyayî ko di şer d e li ber lingan ç, niha, bêq uwet, bêtaqet û bêhêvî, hewl dide da ko rojên kambax biqedîne. Tevger û serhildanên kurdan bi ser neketine. Gelek rêber û ronakbîr hatine kuştin, piraniya yên mayî bi derine xerîb reviyane. Bûm û kund li ser kaviên welatê kurdan veniştine û dixwînin. Welatê kurdan qulipiye ser gor û goristanê.

155

Di rewşeke evçend kambax û zîz de, meriv dikare çi bike? – Mîrên min, em divê ji vê çyina malwêran re bibêjin bese! Lê çawan? Ji kerema xwe, bila herkes gotin, dîtin û pêşniyara xwe bibêje. Lê berî ko

em dest bi gotinê bikin, eger bi dilê we be, ez dixwazim, em ji bo ruhê pak

ê Emîn Alî Beg û şehîdên me fatîhayekê bixwînin.

Belê, Bavo wefat kiribû. Di rojê germ a 1926 -an de, li bexç mala kekê min Sureya, danekî germ ê êvarê, Bavo di xew re çûbû. û ew hew ji xewê hişyar bûbû. çavên ko bi hêdîka hatibûn girtin, hew vebûbûn.

Bavo, Dayê, Mezo û Kudret li bexçê, li kêleka bîrê rûniştibûn. Mîna her

carê, Dayê purtaqalên yekta yên îskenderiyê dabûn Bavo. Wî ew hêdî hêdî xwaribûn û li ser mala me ya Stembolê, bexç, darên bexç û bîra ko li bexçê bû, peyivîbû. Li gora ko Dayê digot, berî ko Bavo bikeve xewa kûr û bêveger, wî weha gotibû; »Bi xêr, gava em vegeyriyan, divê em bexç malê paqij bikin, zêdehiya dar û beran jêkin, bîrê ji nû ve lêkin û ava wê paqij bikin...« Bi dû re Bavo di xew re çûbû. Mezo û Kudret derketibûn û çbûn gund û Dayê jî şalekî tenik avêtib û ser Bavo û vegeyriyabû hundir. Bîra bexç, Bavo û purtaqalên wî bi tenê mabûn...

Heta kengî Bavo di xewa jînê de bû? Kengî wî gav avêtibû aliyê din ê

xewê, yanê mirinê? Ew êşiyabû? Wî di xewa x we de çi xewn dîtibûn, di xewnên dawîn de çi daxwaz kiribûn? Mixabin, kes bi van nizane, lê çaxa Dayê, ji bo şîva êvarê çbû ko Bavo hişyar bike, Bavo hişyar nebûbû. Bêdeng û bi kîb ariyek ko gelekî lê dihat, wî xatir x westib û çbû.

Bavo, stûna mal û malbata me, tîmsala tarîx û hebûna me, çûbû.

Bavo,

ew însanê ro nakbîr, xwendî û dîtî, xwedyê kitabxana mezin, nivîskarê zarên kurdî, farisî û tirkî, tarîxnas, hosteyê kuliyata »Tarîh- î Cewdet«, hostayê tarîxa Mîr Bedirxan, çûbû... Bavo li welatekî pir dûr, li Misirê çûbû. Safter, birayê min ê biçk, roniya çavên min, li welatekî dûr, li Alemanyayê çbû. Li welêt ko êdî ji me bi dûr bû, li Diyarbekirê, gelek pêşewayên kur- dan, d ost û hevalên Bavo û me, bi dar ve bûbûn û çbûn: Mirinê bi ser me de girtibû. Gotina Bavo rast bû; dewra felekê li ser me kîn bû. Ne bi tenê derd û keserên xurbet û derketinê, lê mirinê jî dest pê kiribû û bi girane û zo mpên xwe dilê me yê birîndar dihinciqand.

Gotinek ko Bavo her digot li Bavo jî dihat; mêrê çê li navê xwe tê.

Mîna

her kirin, tevger û gotina wî, mirina Bavo jî li her alî deng da. Dost, nas û nêz giriyan û li şînê rûniştin. Dijmin, kirêt û hesûd jî kenîyan û rabûn govendê.

156

Ez niha çi bibêjim? Min diviya li ser Bavo, jîn û tecrubên wî, pêwendiya

min û wî gelek tişt binivîsanda. Ne niha di nav van rûpelên de, lê heye ko di nav romaneke din de ko li dora jîna Bavo bihata hû nandin. Lê mîna p ir tiştên din, min ev yeka hanê jî nekir. Min ne ew wext û quwet, ne jî îmkan û destek hebû. Min ê Bavo û jîna wî ji kê re, çawan û li ko binivîsa? Lê eger min kitaba Bavo binivîsa,



min dizanîbû, min ê çawan dest pê biki- ra. Destpêk ê, kê-m-zêde, weha bûya;

Bavo, mamostayê jîna min, hosteyê riya qedera min. Bavo, lawê sirgûnê, kurê Mîrê sirgûnkirî, bavê zarokên li sirgûnê bûyî. Bavo, nobed arê roja yekemîn a umrê min, stêrka çirûsî ya zaroktiya min. Bavo, hevalê xeyalên min, şîrîkê pênûsa min, siya rêzên min, hêza gavên min, hêviya şevên min. Bavo, lawê asîl, bavê serbilind, dostê ziravbihîstiyar. Bavo, bavêmin...

– Em divê li rê û riyên bigerin, weha nabe, weha nikare dewam bike,

Memduh Selîm Beg dibêje û dest bi axaftina xwe ya dirêj dike.

Axaftina wî li ser rewşa Turkiyê û kurdan, serhildana 1925-an a kurdan, encamên serhildanê û rewşa wî bi xwe ye. Mîna ko ew li gotina bigere û wan hilçîne, ew hêdî hêdî, gotin bi gotin, dipeyive. Berî ko ew

gotina xwe xelas bike, bi qasî bîskekê, ew radiweste û li hevalên xwe dini- hêre, paşê dîsan bi pênûsa destê xwe li ser kaxizê li berê çend xêzan dik -

işîne û gotina xwe tamam dike,

– Ji Awrûpa, Iraq û deverên din gelek xeber û name ji min re tên da ko

kurd kirasê çavpahnîyê li xwe nekin, perda nizmahiyê nekişînin ser xwe,

çavên xwe negirin, bêdeng nemînin û dest bi tevgereke nû bikin... êdî

gotin ya we ye.

Piştî ko Memduh Beg gotina xwe xelas dike, Celadet ji cîhê xwe radibe,

– Spas Memduh Beg, ew dibêje, gotinên te sedî sed rast in. Roj, roja şixul û xebatê ye. Cîhan li hêviya den gê me ye, herkes li benda tevgerê ye.

Qet nebe, divê em nîşan bidin ka em kî ne...

5

Tu kî yî, xanima delal? Celadet ji keçika ko derdikeve ber derî dipirse. – Ez Rûşen im, keçik dibêje.

– Rûşen, keça Mihemed Salih Beg? – Belê, keça Mihemed Salih Begê Bedirxanî...

157

– Tu dizanî ka ez kî me?

Keçik, bi qasî bîskeke, bi dîqet, li Celadet dinihêre û paşê serê xwe di

mana »na« de, dihejîne. Keçik wî nas nake.

– Ez Celadet im, kurmamê te Celadet...

– Celadet Amca! keçik, bi nîda, bi tirkî, dibêje û serê xwe dizîvirîne aliyê hundir û gazî diya xwe dike; Yadê, Celadet Amca hatiye, were...

Belê, eynî welê bû. Ji bo hin civîn û hevûdudîtinan, ez çûbûm şamê. Gava ez li şamê peya bûm, min berê xwe da taxa Salihiyê, Cisirî Abdî, nik Hema ma Efîf, mala Salih Beg, kurê mamê min Mehmûd. Ji mêj ve bû ko Salih Beg wefat kiribû, lê mala wî, jina wî Samiye Xanim, ko dotmama min

bû û keça wî Rûşen, li şamê dijiyan. Min navnîşana wan ji mamê xwe Xelîl

Ramî Beg wergirtibû.

Rojeke germ a havîna welatê Sûriyê bû. Xwîdan ji min diç. Min çaketê

xwe yê reş ji xwe kirib û, qu mçika stû yê go mlegê vekiribû û qirawata belek sist kiribû. Hema çi bigire, min hî bi ereb î nizanîbû.

Min şam û axa welatê Sûriyê nas nedikir. Me dest bi xebatê kiribû, roj bi roj, diyartir dibû ka me çi dixwest û em ê biketina pey çi.

Dijmin û kes û hêzên nedost li do- ra me bûn. Em diviya bi tevdîr bûna. Loma min xwest ko ez pêşî herim mala Salih Beg wan.

Min Rûşen di zaroktiya wê de carekê, li Stembolê dîtibû. Gava min li de -

riyê mala wan xist û ew derket ber derî, hingî min cara yekemîn ew mîna keçeke xama dît. Keçikeke hufde–hîjde salî, kin, qut, zirav û

eger ez rastiyêbibêjim, nexweşik, derketibû ber derî. Porê wê kurt, çavên wê biçk, lêvên wê zirav, stûyê wê kurt û destên wê biçk bûn. Lê poz û eniya wê nîşan di- da ko ew Bedirxanî bû. Welê dixuya ko ew li diya xwe çûbû. Ji ber ko bavêwê, Salih Beg ko min ji salên 1910-an, ji Stembolê dinasî, dirêj, girs û li- hevhatî bû. Salih Beg ko hingî li Stembolê sernivîskarê kovara Rojî Kurd bû, bi çelengiya xwe nav dabû û çavên gelek ji metên min li serê bûn. Lê ew li Stembolê nema û ç. Paşê, eger ez ne şaş bim, sala 1915-an, me bi- hîst ko Salih Beg li şamê wefat kiriye. Wî dil hebûye, bi dizî, vegere Cizîra Botan, welatê bav û kalan. Lê berî çûyina xwe, wî wefat kiriye.

Agahî û zanînên min ên li ser Salih Beg û mala wî, bi tenê, ji van çend

rêzan dihate pê. Ne zêde... Lê wê roja leylandên welatê ereban, di nav xwî- danê de mayî, bîhnçikyayî, ez li ber deriyê wan bûm. û Rûşen ko ji jinên ko min nas kiribûn, şehrîban, Saadet Abla, Canan, Monika, pir cihê bû, li ber derî, li hember min bû. Pêlên felekê, yan jî em bibêjin qederê, îcar jî ez

158

avêtibûm ber mala wan. û Rûşenê ji min re digot »Celadet Amca...« Paşê çi bû? Ma wê çi bibûya? Felekê her karê xwe berdewam kir û qedera min, bi

huner û hostehî, hûnand...

– Celadet Amca, biferme, were hundir, keçik dibêje, -bêyî ko li hatina

diya xwe bipê.

Keçik rê nîşanî Celadet dide û herdu bi hev re derbasî aliyê hundir dib-

1. Li paş derî sewkiyeke fireh û hinekî bilind, li pey jî hewşeke fireh a

malê heye. Sewkiya serîgirtî bi bahlîf û doşekan raxistî ye. Gava keçik li

ser sewkiyê cîh nîşanî Celadet dide, diya wê jî tê nik wan.

– Celadet Beg, tu bi xêr û xweşî hatî, ser seran, ser çavan, diya keçikê

dibêje. Fermo, rûne, bîhna xwe vede...

– Ma hûn nikarin taseke ava hênik bidin min, Celadet xwîdana eniya xwe paqij dike û dibêje. Ez fetisîm, ji tîna bihecîm.

Keçik dilezîne hundir. Diya wê jî tê û li ser doşega kêleka Celadet rûdine. Celadet diya Rûşenê nas nake û cara yekemîn e ko wê dibîne.

– Samiye Xanim, heye ko di zaroktiyê de me hevûdu dîtiye, lê nayê bîra

min. Min navê we gelekî bihîstibû, lê heta niha qîsmet nebû ko em hevû -

du bibînin...

– Me jî, hem min hem Rûşenê, pir dixwest te bidîta. Berî niha bi çend

rojan, Apê Xelîl Ramî xeberek şandibû û gotibû ko tu dê werî şamê. çavê me li rê bû... Bila serê te, serê me sax be, em hemû pir li ber wefata

mamê min Emîn Alî Beg ketin. Ew hîmê hebûna me bû...

Keçik, siniyek di destan de, dilezîne û tê nik wan. Ew tasa avê dide Celadet û tebaxa ko bi zebeşê dîlimkirî tijî ye, datîne ber wî. Celadet radi- hêje tasê û bi carekê wê vedixwe. Piştî ko ew avê xelas dike, ew taseke din

dixwaze.

– Zêde av ne baş e, Celadet Amca, keçik jê re dibêje. Hinekî şûtî bixwe,

ew ê tiya te bişkîne.

6

– Hevalên ezîz, xelk tî ye, ji serfirazî û bi serketinê pê ve, tu tişt tiya xelkê naşkîne, Xelîl Ramî Beg, kalê civînê, dibêje û gotina xwe didomîne. Ev xelkê belengaz her bîndest e, her darbe dixwe, her

dibe dîlê xelkê. Bi sedan sal e ko qedera vî xelkê weha kambax e.

Kevirên

Xwedê hemû li ser vî milletê stûxwar û bêkes barîne. Ma ne wext e ko ev

159

qeder biguhere? Partî, Xoybûn divê bi vî karî rabe, divê vê qederê êdî biguherîne.

Kurdên derketî yê Tirkîyê û kurdên Lubnan, Sûriye û Iraqê gihîştine hedefa xwe ya yekemîn. Wan bi hev re, li Lubnanê, partiya xwe ya siyasî, partiya Xoybûnê, damezrandine. Hemû kurdan, axa, beg, şêx, serekeşîr,

ronakbîr, zana, nivîskar, rojnamevan, esker, zabîr, kumandar, bijîşk, mamoste, karker, gundî, rêncb er, mêr, jin... hemûyan xwe li dora Partiyê

girtiye. Bi gotina Xelîl Ramî Beg, wan bi hev re çirûska hebûn û rabûnê

pêxistine. Partî bû ye stêrka şevên reş, hêviya heyamên tarî. Partiyê ji niha ve deng daye. Lê kêmanî hê p ir û pir in. Ji partiyê re rêxisineke têkûz koli welêt xurt e, divê. Jê re pêwendiyên xurt yê navneteweyî divên. Jê re îmkanên aborî divên, xelk û eşîr, çek û pûsat, esker û kumandar, rêber û

pêşewa, çûyin û hatin, xwendin û nivisîn divên.

Jê re liberxwedaneke qehîm, serîhildaneke xurt divê.

Loma, îro, di vê roja xweş a bihara Lubnanê de, mîna gelek carên din,

rêber û damezrevanên partiyê li hev rûniştine û li pirs û hedefên partiyê hûr dibin. Mîna her carî, mezintirînê civatê Xelîl Ramî Begê Bedirxanî,

mamê Celadet, mutesarifê kevn ê Malatyayê, civînê bi rê ve dibe. Ew li saloneke biçûk a pansiyonekê rûniştine. Ev civîn, civîna dawîn a

serekatiyê ye. Piştî vê civînê, ew ê, ji bo kar û şixulê partiyê, belav bin û

heryek ê bi derekî de here. Civatê di nav xwe de hin karên esasî belav kirine; Celadet û Memduh Selîm Beg bûne berpirsiyarên giştî

yên gerandina karên rêxistinî û îdarî. Kamuran bûye berpirsiyarê malî. Sureya Beg, Mewlanzade Rifat Beg û hin kesên din ko ne li civînê ne, bûne berpirsiyarên pêwendiyên. û Ihsan Nûrî Paşa ko di ordiya Osmaniyan de zabitekî navdar bû û niha li çiyayê Agiriyê rêberiya ser- hildaneke kurdan dike, bûye kumandarê giştî yê hêzên çekdar ên partiyê.

Em li taxeke derveyê Beyrûdê, di salona biçk a pansiyonekê de civiyabûn. Tevdîrên me tamam bûn. Li der ji malbata Haco Axa û şahîn Began çend kesên çekdar li nobetê bûn. Li pansiyonê jî, ji me pê ve, tu kes nîn bû. Xwarin û vexwarina me ya çend ro jan hazir bû. Civîn gelek girîng bû. Em her yek ji dereke dûr hatibûn... Eger heşê min min nexapîne, ez bawer im, civînê du roj û nîv dewam kir. Me gelek pirs zelal kirin, kar û bar diyar kirin û hîmên esasî yê partiyê ava kirin.

Kî di civînê de hebûn? Mixabin, hemû niha nayên bîra min. Lê ez, sim-

160

bêlqusandî, li wir bûm! Kekê min Sureya, simbêlbadayî, ji Misirê hatibû û li wir bû. Kamo, birayê min ê nû simbêlberdayî ko doxtora xwe li Munîxêtemam kiribû û dabû pey min, hatibû, li wir bû. Em hersê bira, bi xurtî, bi dil û can, ketibûn nav refên pêşîn ên tevgera nû ya kurdî. (Eger tu xwişk û birayên min ên din, Tewfîk û Hîkmet bipirsî, ew li Stembolê bûn û hema çi bigire tu pêwendiya me bi wan re nîn bû. Bi dû wefata Bavo re, diya min û Mezo, li ser daxwaza wan bi xwe, vegeriyabûn Stembolê, mala me ya Kizitoprakê. Ji bo selameta wan, me nedixwest tu pêwendî bi wan re daniya.) Mamê min Xelîl Ramî Beg ko ji aliyê rejîma nû ya Tirkîyê ji welêt hatibû derxistin, tevî vi umrê xwe yê kal, li wir bû. Yek ji nêzîktirîn dostên min ên Stembolê Memduh Selîm Beg, mîna her gavê xweşlixwekrî û porşehkirî, li wir bû. Xwediyê rojname me ya Stembolê Serbestî, hostayêmin ê rojnamevaniyê Mewlanzade Rifat Beg ko mîna mamê min, hatibû bi dîrxistin, westiyayî û heşê

wî li dereke din, li wir bû. Yanî birekî girîng ê jîna min a Stembolê koç kiribû û hatibû Lubnanê.

Ji kurdên Sûriyê Mistefa û Bozan şahîn Beg, ew herdu birayên qedirbilind, simbêlbadayî, li wir bûn. Haco Axa, serekê eşîreke mezin û dostê malbata me, li wir bû... û hîn gelek kesên din ko niha nayên bîra min. Me gotibû »Destê bi tenê deng jê nayê« û xwe dabû hev. îcar me dil hebû, bi qewlê mamê min, tiya xelkê belengaz bişikanda û qedereke xirab û kambax a sedsalan biguheranda.

Heçî ez bûm, belê, gava ez ji Misirê daketibûm Lubnanê, mîna nîşana

dem û heyamên nû, min simbêl jêkiribû. Lê mîna pirî caran, ez di vê fikra xwe de jî şaş ketibûm. Mîrê kurdan bê simbêl nedibû! Kurdan mîrên xwe bi rîh û simbêl d izanîbûn... Min dîsan dest pê kiribû û simbêl berdida. Evyek.

A diduyan, min dîsan dest pê kiribû û deftera ko Cananê, yara min a ne-

mir ko min dikir, nedikir, nikarîbû şopa wê hilda, dabû min, ji nû ve, piştî wefata Bavo, vedikir. Defter ji bo xulase û kitekitên rojên germ ên partiyê diviya. Min ew ji çanta biçk a textîn derxistibû û xistibû paşla xwe. Jê bîh- na Cananê dihat. Defter û xeyalên yara windabûyî êdî li nik min bûn.

A sisiyan, min dest pê kiribû û rûyê xwe ji Ewrûpa dizîvirand û ber bi

welêt dikir. Monika name dişandin da ko ez biçma ziyareta wê. Piştî wefata Safter, Peîkanê çend name nivisîn da ko ez vegeyriyama Alemanyayê û min ew û qebra Safter ziyaret bikira. Hevalbendên me yên partiyê, ji Parîsê, name dinivîsîn da ko ez biçma ziyareta wan. Lê ez diviya li Rohilata Navîn bimama. Xebat û şixul li navçê pir bû û li navçê girîngtir bû.

161

(Min p ir dixwest biçûma ser gora birayê xwe yê siûdxirab û bêkes, lê min

keys nedidît.) Min xwe spartibû şevên spî yên Lubnanê û gav bi gav, nêzîkî

li dilê Rohilata Navîn dikir, tûla li ser rûyê wê radikir.

– Partiya Xoybûnê hebûna me ye, heyîn û heyîtiya me ye, Haco Axa li

ber xwe dinihêre û dibêje. Me hemûyan pir şaşî kirin. Dijminan jî ev şaşiyên me bi kar anîn. û dewletên serketî, nemaze Ingilîstan û Franse, mîna ko mesûlê şerê cîhanê em bûn, welatê me perçe kirin, piştta me şikandin... Doza me mezin e. Bila Xoybûn bibe xwediyê me, xwediyê

doza me.

Piştî ko Haco Axa gotina xwe xelas dike, Xelîl Ramî Beg radibe ser piyan û dibêje,

– Birano, ev bûn çend saet ko em li ser van kursiyên hişk rûniştine, em

qerisîn... em westiyan... birayên me li jêr xwarin hazir kirine, em dakev in

û pariyekê bixwin.

162

FOTOGRAF 10: Aş çûye; kurd li çeqçeqokê

dipirsin...

1

Ev fotografê dehan a ko sê kesan nîşan dide, fotografêke taybetî ye. Ev fotograf di nav hemû fotografên romanê de xwedî cîhekî xas e. Fotograf, ya şoreş û şoreşgerî, çek û çekdariyê ye.

Fotograf, ya heyama tevger û rêkxistina Xoybûnê ye. Fotograf nîşana kel û best, daxwaz û coşa rabûn û serhildanê ye. Li fotografê sê kes dixuyin; Celadet Alî Bedirxan, lehengê vê romanê,

Qedrî Cemîlpaşa û Ekrem Cemîlpaşa, pismamên hev ên man û nemanê,

dostên Celadet Beg, rêberên nû yên Partiya Xoybûnê. Hersê heval, her-



sê rêber, li kêleka maseyêke dirêj rûniştine. Li ber wan, li ser masê nexşeyek heye. Wan nexşe vekirine û bi dîqet lê dinihêrin. Celadet Beg li

kêlekeke masê, Ekrem Beg jî li kêlekeke din rûniştine. Qedrî Beg di navbera herduyan de ye. Hersê li kêleka hev rûniştine û li nav û xêzên

nexşê dinihêrin.

Kincên ko li ser wan in, kincên heyama Xoybûnê ne; kincên çekdaran.

Li ser milê Qedrî Beg çaketek heye. Wî çaket li xwe nekiriye, lê avêtiye ser milên xwe. Celadet û Ekrem Beg bi tena q utik in. aend qumçikên jor ên sîngê yên Celadet Beg vekirî ne, porê wî kin q usiyayî, simbêlê wî hatî ye.

Welê dixuye ko ew, ji çend rojan û vir ve ye, kur nebûye. Kincên herdu pismaman, Qedrî û Ekrem Began, bi şal û şepikên kurdan dişibin. şal û

şepikên ko di lec, pêveçûn û şeran de kincên herî baş in. Qutikên wan jî,

ji qutikê bêtir bi kiras dişibin û heta qirikê, bi qumçikan, girtî ne. Serê

Celadet Beg vekirî ye, porê wî tevîhev e, lê yên Qedrî û Ekrem Began bi kolozek û şarekê li dor pêayî girtî ne. Simbêlê wan ê bad ayî pir xweş li cil

û bergên wan tê.

Heta vê derê, tevî kincên Qedrî û Ekrem Began, fotograf tiştêkî zêde nabêje. Meriv dikare bawer bike ko ew li seyrangehekê ne û li nexşeyêke, em bibêjin, welatekî Awrûpayê dinihêrin... Yan jî ew li ser riya nêirê ne.

Lê du tiştên din ên fotografê hemû fotograf îzeh dike; çek û pûsatên

163

Ekrem Beg û mohra li ser masê. Belê, Ekrem Beg bi çek û rext e.

Tifingeke zîvhêlî ya şeşxana helqedar di navbera herdu lingên wî de ye. Tifing ber bi jor, ber bi aliyê navlûyê rawestayê. Wî destê xwe yê rastê

daniye ser lûla tifingê û bi wî awayî li nex şê dinihêre. Wî rexteke bi ke- spikan neqîşkirî li piştê xwe girêdaye, çenteyeke reş a eskerî û cewdikekî biçk jî xistine milê xwe. Tifing, kemera tifingê, çanta eskerî, cewdik û

rext, bi qumçikên zîvîn, bi neqş û xemil, dibiriqin. Ekrem Beg hemû tevdirên xwe stendine; ew, ji bo çiyayên asê, warê serhildanan, amade ye!

Mohra li ser masê jî mohra Partiya Xoybûnê ye. Mohr hertim li nik serekan e û serek hertim kar û şixulê xwe bi mohrê dibînin û digerin.

aek, rext, mohr û bala wan nîşan didin ko ev hersê heval bi karekî girîngê eskerî rabûne, belê, bi şixulê serhildaneke kurdan ko Partiya Xoybûnê

li pey e, mijûl in.

Fotograf li ko û kengê tê kişandin? Ne fotograf bi xwe, lê destnivîsa xwar û xweş a Celadet Begê ko li piştê fotografê ye, vê yekê diyar dike;

Hasiçe, Temmuz, 1930.

Bi vê nav û nîşana cîh û wextê êdî fotograf bi her awayî diyar dibe; fo-

tograf, a heyama dijwar a şoreş û serhildanan e. Salên dawîya 1920-an û

destpêka 1930-an, ji bo kurdan, salên gelekî aloz, tevîhev û dijwar in.

Kurdan şikest li ser şikest xwarine. Serhildana wan a 1925-an têk çûye û

serekên serhildanê li bajarê herî mezin ê kurdan Diyarbekirê, bi dar ve bûne. Serhildanên wan ên 1926-27-28-an jî bêhavil mane. Pêlên serhildanan, ji ber gelek sebebên, şikestine. Lê serhildan didomin, bi gotina Partiya Xoybûnê, hêvî neçilmisiye. Niha, di

dawiya salên 20-an de, kurdan ala serhildanê, îcar, bi rêberiya Partiya Xoybûnê, li dora çiyayê Agiriyê hildane. Lê serhildana ko di destpêkê de xurt û geş bû, niha, nikare bi pêş keve. Dor lê tê girtin û nefes lê diçike. Rejîmên Tirkiye û Îranê li hev hatine; serhildana kurdan divê biperçiqe... Serhildan û serfirazî, perçiqîn û bindestî... jiyana kurdî ya salên 30-an li dora van gotin û kirinan hatiye rapêçandin. û di navenda vê jiyânê de jî, ev hersê rêberên kurd li odeyeke bêtekber, vala û rût, li dora masayekê, rûniştine û hewl didin ko mêzîna qedera kurdî ber bi serfiraziyê dakeve. Celadet Beg bi destê xwe yê rastê, li ser nexşê, cîhekî nîşan dide. Herdu pismam jî bi hizr li eynî cîhî dinihêrin. Herdu destên Qedrî Beg li ser masê ne, di destê wî yê rastê de pênuşek heye. Destê rastê ber bi destê Celadet Beg çûye. Welê dixuye ko haya wan ji fotografkêş nîn e. Ew ne bi fotografê, lê bi

164

şixulekî cidîtir mijûl in. Lê digel vê yekê, fotograf, bi gotina fransîzan »theatral« e. Tê de jîn heye, ew jîndar e. Gerç ew li fotografkêş nanihêrin, lê mîna ko haya wan jê heye ko ev fotograf dê, rojekê, bibe fotografa salixdana salên 30-an û bibe behsa romanekê! Mîna ko ew dixwazin awir û nêrîna xwe, ked û leбата xwe, bi alîkariya fotografê, vebihuhezînin nifşên nû. Mîna ko wan dil heye ko ew vê kurtedema bîhnekê ko tarîxî ye, bikin tarîx! Ew li nexşê ber xwe dinihêrin, lê mîna ko ew li pêşerojê, li nifşên nû dinihêrin. Belê, ji fotografê baş diyar e ko ew bi dûrbînî li nexşê dinihêrin...

Fotograf mirî ne; bêzar û bêziman, bêdeng û bêpejn in. Kesê ko li wan dinihêre, li gora xwe, jiyaneke û dengekî dide wan. Lê ev fotografa dehemîn a dijî, tê de jîndariyeke xurt heye. Awir û nêrîna wan a cidî, rûniştin û rawestana wan a qaîm, cil û bergên wan ên deşt û zozanan, nexşe û mohra li ber wan, çek û rextên neqîşandî, ev hemû tişt, jiyaneke taybetî dide vê fotografê. Nêrevan, bivênevê, bi heyecan lê dinihêre. Şoreşgerên heyama dijwar û fotografa şoreşgeran heyecan dide nêrevan.

2

Hawirdor heyecan dide Celadet Beg. Ew bi heyecan li tîrêjên tavê ko li hember wî hiltên, li çiyayên asê û li refê teyrên ko difirin dini- hêre. Ro, bi rengê helesor, li pey çiyân, hêdî hêdî, hiltê. Ji dûr ve, dengê dîkin tê. Dinya zelal û hinekî sayî ye. Dinya kirasê belek ê havînê li xwe kiriye. Hawirdor bi rengên têvel xemiliye. Dinya hişyar dibe û haziriya rojeke nû dike.

Rojeke nû ya havîna 1929-an dest pê dike. Celadet Beg bi hêdîka derî bi piştî digire û derdikeve ber derî. Ew li welatê bav û kalan, li deverên Behdînanê ye. Ji bo gerandina kar û xebatên Xoybûnê, ew û çend hevalên wî, bi hev re, hatine nav kurdan, welatê Iraqê. Ew xwe dide hev, cakêt û pantolê xwe hinekî rast dike û dere çend mîtro ji derî bi dûr, li ber dîwarê xênî, li ser totikan rûdine.

Ev aramî, ev bêdengî! Ev zelalî, ev paqijî! Di cîhaneke dîn û har de ev bihuşt!..

Belê, min jî di deftera xwe de welê nivisî. Bi kurdî; ev bihuşt... Tiştên ko min dinivîsîn, bîr û hizrên min, hîs û dengên min bûn. Gava ez bi tenê dimamû d ifikirîm, ew tiştên ko min dixwestin ji xwe re bigotina, min li ser kaxiz

165

dinivîsîn. Wê rojê jî welê bû; aram, bêdeng, zelal û paqij. Cara yekemîn bû ko ez li heremê Behdînanê bûm. Ez hatibûm dilê welatê kurdan. Zarê bav û kalên min, devoka Cizîra Botan û Hekaran, li wir, bêrawest, dihate peyivîn. Zimanê kurdî, zimanê jîn û civatê bû! Kal û pîr bi kurdî dua dikirin, sond dixwarin. Jinebî bi

kurdî nifir li dora xwe dibarandin. şivan û gavan bi kurdî naxir û keriyên xwe diçrandin. Zarok bi zimanê maderî digiryan û dikenyan. Dê zarokên xwe yên dergûşê bi kurdî dilorandin. Civat bi zi- manê kurdî radibû û rûdinişt û digeriya. Dengbêj û çîrokbêj gotinên kur- dî, mîna almas, yaqût û ziberced, li hev digerandin. Zimanê kurdî jî, mîna wê roja nû, zelal û paqij bû.

Ev yeka hanê, ji bo min, kurdê mu haceretê, mehkûmê zimanên biyanî, bûyereke girîng bû.

Lê berî ko ez gotina xwe bidomînim, min divê ko ez şaşiyeke te rast bikim. Ew roja ko tu niha behs dikî, rast e, rojeke havînê bû, lê ne ya 1929- an. Ya 1928-an bû. Ev yeka baş tê bîra min, ji ber ko ez bi tenê sala 1928-an çm Iraq û îranê. Ji destpêka tîrmehê heta dawiya salê, ez li wan deranmam. Gera min û çroka min û wan rojan dirêj e. Min hin bûyerên muhîmên wan rojan di deftera xwe ya biçk de, di deftera Cananê de, nivîsîne. Gelekî di ser re û bi çend gotinan... (Heye ko weha hîn çêtir bû.) Tiştên ko min hingî nenivîsîn, ne hewce ye ko ez niha jî bibêjim. Tiştên ko min di defterê de nivîsîn, ne hewce ye ko ez niha dubare bikim. Bi kurtî, ez weha bibêjim; Xoybûn, hebûna kurdan xurt dibû. Partî çêbûbû, bi rê ketibû, liher alî deng dabû. Bi gotina kurdan, me mû bi mû rîhek çdikir. Ji her alî kurdan dixwestin bi me re pêwendî ava bikirana. Herweha ji Iraq û îranê jî. Li Iraq ê perçeyekî mezin ê milletê kurd dijiya. (Jixwe heta salên 1920-an, welatekî bi navê Iraqê nîn bû, ew dever jî perçeyekî dewleta Osmanî bû ûperçeyekî mezin ê welatê kurdan jî tê de bû...) Li ser tixûbên îranê, li aliyê Tirkîyê, kurdan bi rêberiya partiyê û kumandarê kurd Ihsan Nûrî, ser- hildanek li dar xistibûn. Partiyê diviya xwe bi wan deveran bighanda. Loma ez wê roja ko tu qal dikî, li wir bûm. Ez li rê bûm û ber bi îranê diçm.

Min ê hem li Iraqê hem li îranê gelek kes bidîtina, gelek tişt bikirina û xwe bi tixûbên serhildanê bigihanda...

Celadet Beg ji berîka xwe pakêta cixarê û heste derdixê û cixareyekê vêdixê. Ew li gund û xaniyên gund dinihêre. Xaniyên mîna xirbe, bi ke-

virên reş, peregende, lêbûne. Li pêşiya wî, bi qasî pêncî mîtro jê bi d ûr, meydana gund û kahniya gund xweşiyêke aram dide gund. Celadet Beg

166

li xuşexuşa ava kahniyê guhdarî dike. Ew nefesekê ji cixara xwe dikişîne û li çiyayên hember xwe dinihêre. aiya mîna şerîdekî, mîna zincîreke reş li ber wî rêz bûne.

– aiya û kurd, ew bi deng difikire û dibêje... aiya û kurd... Ma Ksenefonê yewnanî, berî niha bi hezar salan, negotibû ko kurd û çiya aşiqê hev in?..

– Celadet, ew didomîne û dibêje, Celadet, Ceco... Te piştta xwe daye ku? Te berê xwe daye ku? Umir ji sîhî diqulipe ser çelî. Jîn diqulipe ser xewneke tevlihev. Bav çû, yar ç, welat çû, jîna Stembolê ç, xeyala vegeerê çû... Dûmahîka vê riyê çi ye, li ko ye?

Hingê deriyê xaniyê kêlekê vedibe û jê keçikeke 6-7 salî derdikeve. Keçik li Celadet Beg dinihêre û bi şermokî jê rû badide. Celadet Beg bang keçikê dike,

– Delalê, metirse, were, were nik apê xwe. Keçik bi hêdîka tê ba wî. Ew bi destê keçikê digire û bi destê rastê porê wê dide hev. Keçik porzer û çavşîn e.

– Navê te çi ye, delalê, kezîzerê? – Rûşen e, keçik li pêşiya xwe dinihêre û dibêje.

– Wey... navê te pir xweşik e. Navê bapîra min jî Rûşen bû. Navê dotmameke min jî Rûşen e. Tu rû bi şên bî, keça min...

– Mamo, tu dê li gundê me bimînî? – Ma tu dizanî ez kî me, Rûşena delal? – Erê, babê min gote min... Tu mamo yî, Mîr Ceca... ced...

Celadet Beg dikene û keçikê hambêz dike. – Tu dê li gund bimînî? Mîr Ceca... ced hatiye me xelas bike?..

3

– Berî çûyina min, navê min li dewerên ko ez ê biçûmayê, belav dibû, Celadet Beg dibêje. Xelkê belav dikir û digot, »Mîr Celadet

hatiye welat xelas bike...« Loma jî ez diçm ko derî, li wir zabit, eskeriye û mixaberat li pey min bûn.

Celadet Beg, li şamê, li mala Samiye Xanim û keça wê Rûşenê ye. Wan Celadet Beg ezimandine şîva êvarê. Celadet Beg jî tevî çend dostên xwe, Haco Axa, Bozan şahîn Beg û çend kurdên din ên Sûriyê hatiye malê. Ew li oda rûniştinê ya malê li ser doşekan rûniştine. Samiye Xanim, Rûşen û du hevalên Rûşenê bi haziriya xwarinê mijûl in. Rûşen û diya wê

167

di navbera odeyan û mitbaxê de derin û tîn. Carina jî Rûşen tê û li ber deriyê odê, li ser kursî rûdine û guhê xwe dide sohbeta odê.

– Em bi heviyên mezin çûbûn wan aliyan, Iraq û îranê, Celadet Beg ji hevalên xwe re dibêje. Lê kurdan bi xwe, bi gotin û nezaniya xwe, rê li me girtin. Kurd hînê xebatên nehînî û rêkxistinî nebûne, hê jî bi awayê eşîrî li meselan dinihêrin, ji mêvanperwerî, d ilsozî û fedakariyê re bêpayan in. Lê heçî xeb ata modern e, ew jê bi dûr in. Ew hê nizanin teşkîlat çi ye! Min bi hezar zehmetî xwe ji destê rejîma îranê xelas kir.

– Mîrê min, tu hê kurdan nas nakî, Haco Axa bi ken dibêje, te hê tiştêkî wan nedîtiye!..

– Me dil heye ko em sifrê li vir, li erdê, raxînin, Rûşen dikeve hundir û dibêje. Gelo bi dilê we ye? Yan na, em divê derbasî aliyê mitbaxê bin.

– Heyra ev der çêtir e, Haco Axa dibêje, me mebin û mexin mitbaxa teng û me li dora kursiyan rêz mekin. Em ê li vir, li erdê, li gora edetên xwe bixwin.

– Jixwe me jî, ji bo Apo Celadet û we, şîvên bav û kalan çkirine. Rûşen dibêje û dibeze aliyê din ê malê. Jin, bi hev re, di kêliyêkê de, sifrê hazir dikin, xwarinan, yek bi yek tînin ser sifrê, firaqan li ber mêvanan datînin. Celadet Beg û hevalên wî li ser sifrê rûdin. Her texlît xwarin li ser sifrê heye. Ji sifrê bîhneke germ a şîvên têkel difûre.

– Ev, kutilkên melakê ne, Rûşen, li pê sekinî, dibêje. Li gora gotinan, Mîr Bedirxan jê gelekî hez dikir û heta li Girîtê jî ev kutilk didan çkirin. Ev jî sawara kerengê ye ko kalikê min Bedrî Paşa jê gelekî hez dikir. Ev jî kipe ye ko diya min dibêje, mamê me Emîn Alî Begê rehmêtî jê gelekî hez dikir. Ev jî helise û metfînî ne ko Apo Celadet ji wan gelekî hez dike... û xelas! Sifra me ya feqîr bi tenê hewqas e!..

– Mala we ava be, Bozan Beg dibêje, ma ji van şîvan xweştir çi heye? We em xenî kirin. Hûn jî werin, em bi hev re bixwin?

– Na, spas, hûn bixwin, piştî xizmeta we, em ê li aliyê din bixwin.

– Rûşen tu were, rûne, Celadet Beg dibêje. Te behsa bav û bapîrê min kir. Tu were rûne, ez jî hinekî behsa wan bikim.

Wê êvarê, belê wê êvarê germahî û dilsoziya Rû şenê bala min kişand. Amojna Sitî ko bi xwarinên xwe yên Cizîra Botan meşhûr bû, hertim digot, »Mastê payizan deynin ber ezîzan, mastê biharan bidin neyaran. şîv û xwarinên Cizîra Botan deynin ber mîr û ezîzan...« Wê êvarê jî Rûşen û diya

168

wê şîvên Cizîra Botan danîbûn ber me... Ji ber ezîziya xwe, germahî û dilsoziya xwe... Ez ji îran û Iraqê nû vegeyriyabûm û hatibûm Lubnan û Sûriyê. Min rojên pir dijwar li pey xwe hiştibûn. Bi rastî jî ez hewcedarê germahî û dilsoziyê bûm...

– Rûşen, te, diya te, hevalên te, we em îşev îhya kirin. Te ez birim rojên

min ên zaroktiyê... Te dizanîbû ko ez li qonaxa kalikê te Bedrî Paşa ha- time dinê? Te dizanîbû ko ez di hembêza dapîra me Rûşen Xanimê de, cara yekemîn, qîriyame û wê ez li pêekan gerandime? Te dizanîbû ko bavê te jî, li şamê, li ber destê dapîra me Rûşen Xanimê mezin bûbû? Tu li vî îşê felekê binihêre!... Mîna ko ew jî, Mîr Bedirxan, Rûşen Xanim, Bedrî Paşa, bavê min, bavê te jî, vê êvarê, li nik me ne. Mîna ko ev jî, niha, bi me re, ji van şîvên me yên bav û kalan dixwin. Tu bijî, Rûşen!..

4



– Tu bijî Mezo!.. Li Lubnanê, li mala Xelîl Ramî Beg îro kêf heye. Nameyekê ji Stembolê, ji Meziyetê hatiye. Wê nameyeke çar rûpelî nivisiye û bi dostekî malbatê re, ji kekên xwe re şandiye. Name di navbera wan de narin û nayên. Celadet û Kamuran Beg, herweha Xelîl Ramî û Sureya Beg, gelekî bala xwe didinê ko zirarekî bi xizm û meriyên malbatê yên Stembo lê neyê. Malbata ko di bin çavnêriya rejîmê de ye, bi tu awayî, pêwendî bi endamên malbatê yên derveyî welêt re danayine. Lê ev name ko ji Celadet û Kamuran Began re hatiye nivîsîn, bi carekê, ji nişka ve, gihîşte wan, -mîna pêriyekê, mîna melayika hez û paraziyê.

– Ev rêzên Mezo, ji bo ruhê min ê bedbîn, bûn der manê herî baş, Kamuran Beg rûpelan bîhn dîke û dibêje. Tu her bijî Mezo!

Nama Meziyetê, çar rûpelên mezin, bi tirkî, bi tîpên pir biçk lê pir xweş ko mîna ji destê hetadekî d'erketiye, tijî xeber in; siheta Yad ê baş e, lê ew pir bêriya Celadet û Kamuran dîke û navê Safter hertim li ser lêvên wê ne. Birayên wan Tewfîk û Hîkmet baş in. Herdu jî li ber deriyê dewletê, di cîhên bilind de, dixebitin. Mîna gelek kesên din ên malbatê, ji tirsan tu deng ji wan dernakeve. Rejîma nû ya Tirkîyê paşnaveke nû li malbatê kiriye, »ainar«. Pismamê wan Wasif Beg bûye »muşawîrê serokê ko marê Mistefa Kemal û Mistefa Kemal ew kiriye wezîrê perw- erdeyiyê. Li gora Wasif Beg, Mistefa Kemal bi xwe ev paşnav daye mal- batê û gotiye, »Bedirhanpaşazade ailesi bir çýnar gibi tarihi ve güçlüdür. aýnar ismi onlara yakýşýr...« Zordariya li ser kurdan roj bi roj zêdetir dibe. Her tiştê kurdî qedexe dibe. Herkesê ko bi kurdî bipeyive, tê girtin û jê 169

ceza tê birîn. Kurd, eşîrên kurdan ji welatê xwe, ber bi aliyê Anatoliyê, nefî d'ibin. Tirs û bêdengiyê esmanên Tirkîyê vegirtine. Herç Stembol, bajarê hezkirî ye, bêdeng e. »Eqelîyetên Stembolê« ermen, rûm, ewrûpayî di nav tirseke mezin de ne. Rûmên Stembolê, ji tirsan, bar dikin û koç Yewnanistanê dikin. Lê belê, Stembol hê jî xweş e, hê jî di şevên sayî de

diçirûse, hê jî di her demsalê de xwe bi rengêkî nû dixemilîne, hê jî Bospor, yanê Bo

Ċazîç, bi awirê nazenînan, bi hêdîka xwe dilivîne û diherike. Eger ew behsa Kadikoyê bike, divê ew bibêje ko xelkê nû ji Anatoliyê û ji Trakyayê tên û li wir cîwar dibin. Ew Kadikoya kevn a rengîn û nerm ko warê merivên rengîn û nerm bû, diguhere. Tirkiyekî

ecêb ko wan tu carî nebihîstibûn, hêdî hêdî li Kadiko yê bi cîh dibe. Herç

mala wan e, Meziyet û Yadê li malê bi tenê mane. Tewfîk û Hîkmet zewicîne û bar kirine, çne aliyê din ê Stembolê. Tewfîk çye aliyê şîşlî, warê mamê wan Evdilrezak Beg. Hîkmet jî aliyê Cađalo

đluyê, warê

Celadet Abi. Jina Hîkmet Abi keçikeke xweş, lê »şerût« a boşnak e. Bi alîkariya keçikê ko navê wê Nûriye ye, Meziyetê li Cananê daye pirsîn. Dawiya dawîn, ew hîn bûne ko Canan bi yekî boşnak re zewicî ye û wan

mal bar kirine, çûne Ankarê, merkeza rejîma nû. Li gora ko Meziyetê bi- hîstiye, mêrê Cananê dîplomat bûye... Belê, ew li malê bi tenê mane. Lê

mam, met, pismam, dotmam, nas, xizm û dost hertim tên. Nemaze Saadet Abla û x weha wê hertim li malê ne û li Celadet û Kamuran »abil- er« dipirsin. şehrîban bi xizmekî malbatê re zewicî ye û li Kadikoyê dijî.

Ew jî hertim tê malê û alîkarî dike. Mixabin ew nikarin li bexçê binihêrin. Gerç bexçewanekî, heftê carekê tê û b exçe dide hev, lê kar pir e. Bîra bexç miçiqiye, ew nikarin lê binihêrin. Wan çend darên bexç dane birîn. Lê ew dara ko Safter, Sefo Can lê kolabû, maye. Ew xêzên ko Safter

kolabûn, hê jî dixuyin. aaxa dinya xweş dibe û ew li der, mîna berê, li kêleka bîrê rûdinin, zebeş dixwin, purtaqal û mandarin qaş dikin, hingê,

carina Yad ê dere û destê xwe li ser wan xêzan digerîne û wan radimûse... Bîra bexçe bûye remza roj û dewrên bihurî. Bîr dewranên b erê bi bîr tîne.

Gava kulîlkên spî yên darên behîfan û rengîn yên darên hinaran dibişkovin, ew mase û kursiyên derd ixin b exç, kêleka bîrê û rojên der-

basbûyî yad dikin. Bi xêra bîrê, ew ji dema nû bi dûr dikevin, dewr û

dewranên bihurî dibe stariya wan... Ew li malê bi tenê man e, lê siya Bavo,

Sureya Abî, Celadet Abî, Kamuran Abî û Sefo hertim bi wan re ye. Bedena wan ne li malê ye, lê ruhê wan, siya wan, li wir e. Hertim, her

gav... Hê jî li mal, kes li ser kursiyên Emîn Alî Beg rûnane, kes destê xwe

170

nade kitab, kovar û defterên wî. Kaxiz û defterên Celadet Abî di berkêşkên masa oda kitabxanê de veşartî ne. Meziyet li nivîsar û bendên Celadet Abî yên rojnama Serbestî jî pirsîne. Ew ê wan jî bide hev. Şîrên Kamuran Abî yên abadîn ko bi fransizî hatine nivîsîn, di nav dosyekê de,

li nik Meziyetê ne... Albuma Meziyetê ji destê Yadê, Saadet Abla û yên din nakeve. Ew her lê dinihêrin. Ew bi fotografan re dipeyivin, fotograf jî bi wan re. Herkes li wan, li Sureya, Celadet û Kamuran »abiler«

dipirsin... û xebereke yan jî mizgîniyeke xweş; li go ra ko tê gotin, rejîma nû û serekê rejîmê Mistefa Kemal li efûyeke giştî difikirin da ko quweta tevgera derveyî welêt ko li dijî dewletê ye, daxînin. Yadê û Meziyet bi tenê

vê yekê, bi tenê efûya Sureya, Celadet û Kamuran »abiler« ji Xwedayê

Alemîn dixwazin. Heke rojekê ew Sureya, Celadet û Kamuran »abiler« li Stembolê, li Kadikoyê, li mal, dîsan mîna berê li mitbaxê, li kêleka hev, li

hember hev rûniştî bibîn, ew ê hezar hemd û spasiyên xwe pêşkeşî

Yezdanê mezin bikin...

– Tu her bijî Mezo, xweha min a jîr...

Kamuran, birayê min ê ziravbihîstiyar, welê digot û bi kêfxweşî name bîhn dikir, -bi çavên tijî hêstir. Ziravî û bihîstiyariya wî, kêfxweşî û hêstirên wî ne bê sebeb bûn. Em li Rohilatê bûn, li hespên rewan ên aloziyê siwar bûbûn û me di ser çal, kort, gelî û newalan re gav dikir. Do ra me bi zehmetî, di - jwarî, alozî û bêgaviyê rapêayî bû. Rojê Rohilatê bi rojê din nedima, her roj tiştêkî nû ko ne di hesabê de bû, diqewimî. Her roj ji ti ş tekî nû re avis bû. Stêwrî li navç nîn bû! Min hê jî bi b est Bismark û Nietzsche dixwendin û li dengê gur ê Nietzsche guhdarî dikir. Nietzsche digot, kesê ko wî dixwîne, tevî gotinên wî hildikişşe lûtkeyên çiyayên bilind û sar, lê belê ez li Rohilatê, warê herî germ ê cîhanê bûm. Ne Bismark, ne Nietzsche, ne Ovidius û ne jî hosteyekî min ê din dikarîbû alîkariya min bikira. Ji birîn û kulên jîne û merhem û dermanên tecruban pê ve tu kesî, tu tiştî nikarîbû alîkariya min bikira.

Em bi xurtî ketibûn nav xebata tevgerî ya siyasî û çekdarî. Mesele, mesela xîret û namûsê, man û nemanê bû. Welat li ber lingan çb û, kurd û k urdanî hew hêjayî tiştêkî bûn. Welat bûbû welatê bûm û kundan, sipir û q ijikan. Me diviya tiştêkî mezin bikira, cendekê li erdê vejanda, ruhê, bi gotina Nietzsche »décandant«, bihejanda. Lê çawan?..

Herçend xelkekî pir û eşîrên mezin li dora me diciviyan, ewçend jî bar gi-

rantir dibû. Merivên me yên têgihîştî û ehlê karê xwe kê m bûn, îmkanên

171

me, tevî ko navê me mezin bû, pir kêr bûn. Me nikarîb û rê li dijîtî û berberiyên axa, beg, şêx, şexsiyet û eşîrên kurdan bigirta û ji bo alîkariya me, tu dewletê xwe nedida ber. Fransizên ko hakîmê Lubnan û Sûriyê bûn, dixwestin rê li kar û şixulên me bigirin. Ew bi rejîma Tirkiyê re li hev hatibûn û nedihîştin ko em gav bavêjin. Wan li min, Kamuran, Memduh Beg û gelek kesên din ên serekên partiyê qedexa kiribûn ko em hilkişyanawelêt, axa kurdan. Mîna mîsal, ez nikarîbûm ji şamê û pê ve biçûma, qedexa bû. (Ez bi dizî, bi hênceta nêrê, diçm.)

û li ser van hemû zehmetiyan jî, derdê me yê ebedî, belayê serê me, nêperetiye, dîsan, nefes li me diçikand. Tevî ko tevger geş bû, bi hezaran, deh hezaran meriv li dorê bûn, me îmkana nîn bûn ko me debara hefteyekê bikira! Carina pere nîn bûn ko ez pê biçûma şamê. Dengê gumîna daholê ji dûr xweş dihat! Li milê d in jî hesret hebû... Hesreta kambax, tevî ko me xwe radigirt, dilê me diheland, laş û bedena me dikizirand . Loma Kamuranê ziravbihîstiyar, li welatê xerîbiyê, di nav keft û lefta xebatê û di- jwariyan de, mîna me hemûyan, ziravtir û bihîstiyartir bûbû...

û Canan... Canana ko her di bîr û heşê min de bû, niha, bi de stnivîsa zêrîn û xemilî ya Mezo, dîsan, şevên min ên Lubnanê, xewnên min ên têkel diherimand. Şeva vê roja ko min û Kamuran li mala mamê me XelîlRamî Beg nama Mezo xwend, min di deftera biçk de, rûpeleke nû vekir û tê de weha nivisî; »Canan, nebixêrê... Tu li ko yî?...« Min bi tenê welê nivisî, lê paşê, min ew rûpel jêkir û çirand... Ez ji Ovidius hîn bûbûm; meriv diviya dilê bi tîrên eşqê birîndar bûyî nede ber agirên xeyalan.

5

Meriv divê dilên ko bi tîrên xedar ên zulmê birîndar bûne, nede ber bayê seqemê teresî û çavpahnîyê, Qedrî Begê Cemîlpaşa dibêje. Jixwe dil şikestî ye, hingî dil dibe dîl. û dilê ko hînê dîlîtiyê bibe, êdî meriv nikare wî zû bi zû, ji dîlîtiyê rizgar bike. Şert û merc dikarin merivan dîl bixînin, lê gidî, bila dil dîl nekeve! Eger dilê mîletekî jî dîl ketibe, hingê ew mîlet li ser rîya windabûnê ye. Em divê welê

qebûl bikin. Niha kurd jî ketine ser riya dîlbûnê û dilê wan jî, mixabin, pê re. Me divê ko em rê lê bigirin, çi dibe bila bibe, em rê lê bigirin...

Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa û Celadet Beg li gundekî Heseçê ko nêzîkî tixûbên Tirkiyê ye, li maleke du qatî, li qata jor, li oda mêvanan, kêleka

maseyeke dirêj, li ser kursiyan, rûniştine û li haziriyeke mezin a Partiya

Xoybûnê hûr dibin. Roj, rojeke germ a tîrmehê ye. Sal, 1930 e. Meha tîrmehê, îsal, li navê xwe hatiye; tîrên rojê yên vê mehê, rasterast xwe bi

172

bedena merivan digihînin. Dinya germ e, pir germ. Lê ew li hundir, li

oda tazî û bêtekber de ne. Karê ko ew pê rabûne, ji her tiştî girîngtir e. Rûyê wan cidî, awirê wan germ e, mîna tava tîrmehê. Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa pismamên hev in, kurdperwerên navdar, ronakbîrên bihîsti-

yar in. Herdu jî li Tirkiyê, di kêliya dawîn de, ji mirinê rizgar bûne û re-

viyane hatine, bi gotina kurdên Sûriyê, »binê xetê, yanî aliyê Sûriyê. Gelek ji heval û hevriyên wan di serhildana 1925 -an de (yan jî piştî ser-

hildanê) hatine kuştin. Bajar û gundên wan xira bûne, mala wan wêran bûye. Ew jî, bi qasî çend salan, li zîndan mane, tevî zar û zê, kal û

pîrên xwe, sirgûnî aliyê Anatoliyê bûne. Ew ji wir, bi dizî, reviyane û hatine li Suriyê xwe bi Partiya Xoyb ûnê gîhand ine. Ruhê wan şikestî, got-

inên wan pêt û çirûsk in, dilê wan bi şewat, birîna wan germ e.

Heval û hogirên wan mirine, ew dijîn. Qedirgir û qedirgiranên wan, li

ber çavên wan, çûne bin sêdara mirinê. Ew dijîn...

– Xwezî em jî tevî wan bimirina, bihatina kuştin, bi dar ve bûna, Ekrem Beg dibêje. Celadet Beg, birayê hêja, ez çawan bibêjim, bi kîjan

gotinan? Niha her rojê me mirinekê ye. Dilê min liyan e. Rûyên heval û dostan ko niha bûne gorbehîşt, her li ber çavên min in... Ev êrîşa ko em

ê bikin, divê bi ser keve, em divê miyaser bin, divê tova gorbehîştan bê

hildan, hesaba tarîxê bê dayin...

Hersê heval li nexşeya li ber wan hûr dibin. Nexşe, nexşa tixûbên di navbera Tirkiyê û Sûriyê de ye. Hevalekî wan ê partiyê, bi dizî, ev nexşe

ji qerergeha eskerî ya bajarê Diyarbêkrê, li Tirkiyê, wergirtiye û aniyê. Wan, car bi car, li nexşe nihêrîne, lê ew divê niha biryar bidin; ser-

hildaneke nû.

– Miyaseriya vê serhildanê bi kurdên li Tirkiyê girêdayî ye, Celadet Beg

dibêje. Heke ew ji wir alîkarî nekin, dest navêjin çekê û ji paş ve li ordiyê

nexînin, em ê nikaribin miyaser bin. Ji lewre, »artçiyên« me divê qaîm,

eşîrên me yên welêt hazir bin. Ew destê xwe datîne ser niqteyekê û go ti-

na xwe didomîne; eşîrên van navçeyan di navbera me û dewleta tirk de

derin û tîn. Me çend qedirbilind û giregir ên navçê şandine nik wan.

– Jixwe welê ye, Qedrî Beg dibêje û bi pênuşa destê xwe cîhekî li ser nexşê nîşan dide, eger eşîrên kurdan ranebin û aliyê me nekin, ne em bi ser dikevin ne jî serhildana Serhadan, Araratê, dikare dewam bike. Li go -

ra xeberên tîn, eşîr li van minteqeyan hazir in ko rabin.

– aend şêx û begên van navçeyan jî gihîştine hev, Celadet beg dibêje  
û

bi tiliya xwe cîhekî nîşan dide. Wan şêxekî hêja şandibûn nik me. Ew  
jî

173

amade ne, lê çekên wan nîn in. Me welê li hev kir ko hin eşîrên aliyê  
Iraqê, tevî çekan, xwe bi wan bigihînin û ew bi hev re quwetekê  
bînin pê.

– Li bajarên mezin ên kurdan, Diyarbekir, Xarpit, Riha, Wan, Bêdlîs  
û

yên din jî berwedaneke bédeng heye. Ekrem Beg bi lûleya tifinga  
destê

xwe dilîze û dibêje. Xelk ji rewşê ne razî ye. Rejîmê qifil û kelemçe li  
zi-

manê xelkê xistiye, esker û merivdewletên rejîmê dibêjin  
»Vatandaş

Türkçe konuş« û zimanê xelkê qedexe dikan. Xelk bi hêvî ye, li hêviya  
hin tiştan e. Lê tirs jî heye. Hem hêvî hem jî cêwika hêviyê tirs heye.  
ko tirs

bê şikestin, hêviyê miyeser be.

– Serekiya serhildana Agiriyê nameyek şandiye û dixwaze ko  
Xoybûn

şixulên xwe, zûtirîn roj, bi ser xîne û dest bi rabûnê bike, Celadet  
Beg

cixare dikişîne û dibêje. Heke rabûn ji vir d est pê bike, ew ê jî, ji jor,  
êrîş

bînin...

Hey gidî!.. ew roj, ew wext!.. Me tovek diçand, -bêyî ko me  
bizanibûya ka kî dê wê ra kira. Ew wext, wexta tevger û xîretê  
hatibû. Wextên weha tarîxî di rojekê de nayên pê. Ew mîna p êlên  
avê ne, gav bi gav, hêdî hêdî, ber bi qi- raxa avê dibin. Di demeke  
dirêj de ew tînen pê, lê çaxa wan a ko ew li qiraxa avê dikevin û winda  
dibin, kurt e, pir kurt e. Di wan rojên gundê Hesiçê de, pêlên



tevgera Xoybûnê li qiraxa avê diketin; me dê êrîş bibira ser Tirkîyê. Me biryar li ser biryar distandin. Bi lez. Bi kel û co ş. Bi heyecan û meraq. Gelo tov ê hêşîn bihata? Kî dê wê biçanda? Em li gundekî ji gundên kurdan ên doralîya Hesiçê bûn. Doralîya me hemû kurd bûn. Me merkeza partiyê veguhestibû warê kurdan. Em gelek bûn. Ne bi tenê ez û Qedrî û Ekrem Beg, lê hevalên me yê din jî li wir bûn. Memduh Beg hertim dihat. Mistefa û Bozan Beg dihatin. Haco Axa û kurên wî dihatin. û gelek kesên din. Hatîn û çûyin boş bû; me dê gaveke tarîxî bavêta. Lê gotina te ye, kesên ko her li wir bûn û dixebitîn, ez, Qedrî Beg û Ekrem Beg bûn. Min Ekrem Beg baş dinasî. Divê bête bîra te, em bi hev re, ez û Ekrem Beg, sala 1919-an, tevî Major Noel û birayê min Kamuran, çbûn welêt, aliyê Meletiyê. Min Qedrî Beg jî, çend caran, li Stembo lê, dîtibû. Ev herdu pismam bi nav û deng bûn. Ew hê nûdaketibûn Sûriyê û bi xebata tevgerê rabûn. Haya wan baş ji welêt hebû. Ew zimanşêrîn û xweşsohbet bûn. Mîna min, wan jî li Stembolê û welatên Avrûpayê xwendibûn. Me ji zimanê hevûdu fahm dikir... Mala ko em lê bûn, bi du qatan lêbûbû. Di navbera herdu qatan de ji

aliyê hewşê, nêrdewaneke bi kevir lêbûyî, hebû. Gava em li hundir di-

174

westiyan û me bîhnvedanek diviya, em derdiketin û li ser pêpilikan rû - diniştin. Me li ser pêpilikan jî, bi şeweyê sohbetê û piraniya caran tevî ze- beş û meyweyên sar, xebata xwe didomand. Nemaze bi şevê, gava stêrdinya ronî dikirin, em bi kêfeke bêpayan li ser pêpilikan rûdiniştin. Stêr, komika sêwiyan, kerwankuj, çerx û felek û yê din, bi rengên taybetî û germ diçirûsîn û kela dilê me bi firê dixistin. Di wan şevan de, bîrayên Lowenberg û konyakên Martel cognac û Courtoise ko Mistefa û Bozan Begên şahîn, hertim, bi xwe re, ji Helebê, Centrale Hotelê, dianîn, şevên me xweştir dikirin. Carina jî di wan şevan de, şewqa heyve ronê û awazên dengbêjên navdar dostiyeke edebî û ebedî dianîn pê.

Hewşeke fireh a malê heb û. Di hewşê de bîreke bi aveke boş hebû. Di danên sibê û êvarê de gavan û şivanên malê d ewar û pezên xwe dianîn û av didanê. Ev yeka hanê jî, ji bo min, însanê bajarên mezin, bergeheke nû x weş bû. Jîn li gund bi celebeke din dimeşiya...

aaxa Qedrî û Ekrem Begên Cemîlpaşa daketibûn Sûriyê, Ekrem Beg bi xwe re kamerayêke fotografê anîbû. Kamara wî di wan rojan de jî, li nik wî bû. »Mîrê min« wî digot, »ev gavên tarîxî ne. Sibê roj jê re îspat divên. Wext mîna hespekî rewan e, diherike û dere. Lê ev resmên ko em niha dikişînin, ê îspat bikin ko me xwestiye, em zikê şeva reş a avis biqelişînin...« Geh wî bi xwe resmên me dikişandin geh jî wî kamera dida hinên din da ko ew resmên me, tevî Ekrem Beg, bikişînin.

Ez dinihêrim ko min dîsan dirêj kir. Ez çend gotinên din jî li vir bi rêz bikim û gotina xwe biqedînim; şeş xane, şeş xana nêrgizî, cehferî, sîhre, çeper, cewdik, şax, dîkik, ling, çifte, qerebîne, şeşderb, êrîş, parêzgeh, siwar, liq, pî, qol... û hwd. Tu dê niha meraq bikî û bipirsî ka ev çi ne? Ev gotinên eskerî û yên tîfing û debancan in. Jîna min a Xoybûnê, roj bi roj, bi wan gotinên eskerî dihate rapêandin. Min kurdiya van gotinan nizanîbû. Lê bi alîkariya hevalên min ên partiyê ko li welêt hatibûn dinê û mezin bûbûn, di nav civata kurdî de jiyîbûn, alîkarî kirin... Di wan rojan de, yek ji tiştên ko Celadet Alî Bedirxan, şagirtê gotinên Xeyam, Xanî û Ovidius, hevalbend ê gotinên Goethe, Lamartine û Baudelaire, dikir, ev bû; wî gotin û termên eskerî, çek û cebirxanan, bi kurdî, dinivîsîn...

– Hevalên me yên Lubnanê nivisîne, Celadet Beg dibêje, wan belavokek,

bi zimanine ewrûpayî û erebî nivisîne, gava êrîş dest pê bike, ew ê herin sefaretên welatên Awrûpa û Amerîka ziyaret bikin û belavokê bidin wan.

– Min li Helebê, Qedrî Beg cixara xwe ya pêçayî bi heste vêdixê û dibê -

je, li Hotel Baronê çend dostên me yê ermen dîtin. Ew ê jî xeber bişînin

ermenên Tirkiye û îranê da ko ew werin yardima me.

– Welê dixuye ko şêxên neqşîbendî û qadirî jî dê bîn aliyê me, Ekrem

Beg dibêje, helbet gava ew bibînin ko em dikarin zora zulmê bibin...

– Kekê min Sureya jî xeber bi rê kiriye. Rewş niha li Awrûpa û Amerîkayê ne xirab e. Hingê birano, wext hatiye.

6

Wexta biryara wexta êrîşê hatiye. Kî çi dibêje bila bibêje, wexta êrîşê ne di cîh de bû. Ji bo êrîşê, me wexteke şaş, gelekî şaş hilbijart.

– Biryara partiyê bi lez bû, hazirî ne tamam bûn, me bi xurtî bawerî nedabû eşîran.

– îşê me kurdan her weha ye; aqilê kurdan paşê tê serê wan. aima me ji vir hin hêzên qewî û çekdar amade nekirin û piştî xwe bi hêz û eşîrên hundir girêda? Mesûlên vî karî kî ne?

– şev radizên, dijmin ranazên... Hevalên me yê mesûl ev gotina kevn ji bîr kirin. Ma qet wan bîr nebî ko dijmin ranazê, ew ê jî tevdîrên xwe bistîne? Li min biborin, lê partiyê xwe lewitand, me jî bi xwe re...

– Me bawerî, dîsan, bi eynî kes û eşîrên ko li şêx Seîd Efendî û serhildana wî ya 1925-an îxanet kiribûn, anî. Ew teres û segbav dîsan bi karê xwe rabûn û îxanet kirin. Lê sûc ne ya wan bênamûsan e, ya kesên ko bi bênamûsan bawer kirin e.

– Ehlê partiyê li serê çîyan tî û birç bûn, lê hin hevalên mesûl bi şampanye û konyakê xwirîniya xwe dikirin...

– 300 lîrayên partiyê wînda ne, ez ji hevalê mesûl dipirsim, ka ev pere li ko ne? Kê ev pere xwarine?

– Tu behsa çî dikî, birayo! Ma ji şevên Berûdê re pere qîm dikin? Hele tu here ji gazîno û meyhanên Berûdê bipirse!..

– Hevalên ko di nav kurdan de nejiyane, kurdan nas nakin, nikarin hereka kurdî bi miyoserî îdare bikin. Ew bi aqilekî din li

herekê dimezînin û tiştan disinifînin. Ma kurd û fransiz yek in? Ma bi xwendina kitabên fransizî, meriv kare kurdan îdare bike?

– Ma îxaneta axa, beg û şêxên kurdan ne meşhûr e, vê îxanetê li hemû dinê nav nedaye? aima, ez dipirsim, çima me bi tenê ew dîtî, çima çavên me yê kor venebûn?

– Me gerek e, em li xwe mikur werin; gelek ji hevalan ji bo şan û şohre-

176

ta xwe ketin nav vî îşî. Hin jî ji bo mal û mulk, erd û ax... Lê çi bû bi me

bû; ko agir bi çiyê ket, ter û hişk tev de dişewitin. Tiştêkî bi x wedanşan û

şohretan nabe, lê em şewitîn.

– Tu behsa çi dikî birayo! Hê êrîşê dest pê nekiribû, ewraqên partiyê û planên êrîşê di destê waliyê tirkan ê Mêrdînê de bûn! Ji bo bihusteke erd û pariyêke malê dinê em hatin firotin...

– Bila xwarzî û birazî li min negirin, lê hin rêberên partiyê jî, ne ji bo welatekî aza, ji bo mîrekiya bav û kalên xwe, bi vî karî rabûn. Wan bi dil û can xwe nedan kar, bi pêwendiyên sefaretan, doza erdên xwe kirin.

– Min ji we re behsa eşîrên navç nekir? Min navê wan yek bi yek ji we re negot? Min navê tirsok, dexsod û fesadkaran nedan we?

– Ev bênamûsê simbêlqît... ma min negot, bila haya hevalan jê hebe, ew ê eşîra xwe raneke, me bixapîne?

– Ya ew rîhdirêjê segbav! aaxa wî bi çavên xwe yê pahn li ber xwe meyzinand, min fahm kir ko ew ê murîdên xwe raneke û neyê aliyê me.

– Tirkan em neşikandin, lê kurdan em şikandin! Ger rojekê tarîx van rojan binivîse, divê, bi tîpên mezin, weha bête nivisîn; kurmê darê ji darê ye, kurd kew e, neyarê qewmê xwe ye.

– Me nikarîbû çare li berberî, dijîtî, hesûdî, çavnebarî û rika eşîrên kurdan bigirta û yekitiya wan çêkira...

– Ya nezanî, nezaniya sedsalan? aara nezaniyê çi ye?

– Min gotibû, eger we bi ya min bikira weha nedibû.

Belê, belê... gotin vala ye, bêkêr e. Em ji pênc qolan, di şeveke tarî de, ketibûn nav tixûbên Tirkiyê, – bi hêviyên mezin... Min û Haco Axa û lawên wî jî dirêjî xeta Cizîra Botan kiribû. Lê heyhat! Piştî rojekê, mîna hevalên din, em jî, dîsan, vegeriyab ûn binê xetê. Me şikesteke nû xwaribû.

aima? aîrok dirêj e, ne tu bipirse, ne jî ez bibêjim... Bila ev çîrok jî, mîna gelekî tiştên me yê din, di nav rûpelên tarî û jibîrbûyî yê tarîxê de razê... Ev got- inên ko tu niha li romanê tînî û dinivîsînî, di civîna me ya dawîn a Xoyb ûnê de dihatine gotin. Na, ne di »civîna ME« de, di civîna MIN a dawîn de. Ji berko piştî wê civînê, ez hew çûm civînên partiyê. Êdî min serê hespê xwe ko di meydana siyasetê de taw dida, kişand û ji wê meydanê bi d ûr ketim... Wê roja civîna min a dawîn, li gundekî Lubnanê, min bi derd û kesereke bêpayan, bi dilekî pir şikestî, li hevalên min ên man û nemanê nihêrîn û ligotinên wan guhdarî kirin. Min dengê xwe nekir, bi tenê li wan guhdarî kir... Min ê çi bigota?

177

Bi tenê min bi pênuşa destê xwe, li ser kaxizê ber xwe, car bi car, heta kaxiz tijî bû, weha nivisî; aş çû, kurd li çeqçeqokê dipirsin... aş çû, kurd li çeqçeqokê dipirsin... ç, kurd li çeqçeqokê dipirsin... kurd li çeq çeqokê dipirsin... li çeqçeqokê dipirsin... çeqçeqokê dipirsin... dipirsin... çeqçe- qok... çeqçeqokê...

Dîsan aş çûbû, kurd ketibûn pey çeqçeqokê, dîsan xelkê aş biribû, kurdan li çeqçeqokê dipirsîn...

178

FOTOGRAF 11: Hawar; hawara gel û welat, hawara dil û can, hawara Bedirxan, hawara canan

1

Rojeke germ a 1932-an e. Celadet ko êdî jê re »Celadet Beg« dibêjin, li ber maseyekê rûniştiye. Pênuşeke dirêj, zirav û reş di nav tiliyên wî de, ew li pêş, li kamarayê dinihêre. Ser masê tijî ye; li koşeyekê çend kitab li ser hev, li kêleka wan sê defter, dido mezin,

yek biçk, li ser hev, li kêleka defteran jî komeke rojname peregende ne. Li koşa ko Celadet Beg li berê rûniştiye, xwelîdan kek û li kêlekê jî sê kitabên gelekî stûr, li ser hev in. Li pêşiya Celadet Beg jî deftereke vekirî, dirêj û mezin heye. Destê wî û pênûsa nav tiliyan li ser rûpela vekirî ya defterê ne. Ew bi karê nivisînê mijûl e.

Ew li pêş, li kesê ko vê fotografê yanzdan a romana »dikişîne, dinihêre. Gelo ew dikene? Yan na, ew bîhnteng e? Bîhnfireh?

Kêfxweş? Bi keser?.. Ev yek ji fotografê naxuyin. Celadet Beg bi tenê, bi rûyekî aram, bi çavên ramantijî, dinihêre. Kes nikare ji fotografê derxe ka Celadet Beg di çi haletê de ye, çi difikire, çi hîs dike. Na, meriv jê fahm nake.

Ew dinivîse, bi tenê dinivîse. çavên wî yên stûr û reş ko her vekirî ne, di vê fotografê de, hinekî girtî ne. Welê dixuye ko wî ji ber hêza tîj û tîra tavê, çav hinekî girtine da ko bikaribe li kamerayê binihêre. Rûyê wî yê gulover û fireh jî hinekî jar û zirav dixuye. Mîna ko ew hinekî jar ketiye. Lê ev jarî lê hatiye, bedena wî ya dirêj û girs xortir û xurtir dixuye. Simbêl her mîna xwe ne; reş, kin û zirav. Simbêlê qerqaş, tevî eniya fireh, hinekî dibiriqe. Tav û tîrêjên tavê li ser simbêl, hinarik û enî dilîzin.

Herç bîvil e, beranî ye; Bedirxanî ye. Tişteki nû li rûyê dirêj û aram zêde bûye; rîh... Celadet Beg rîh berdaye.

Hinekî, bi qasî mistekê... Ne li gora ûsila osmaniyan, lê li gora ûsila ron- akbîr û nivîskarên ewrûpî, bi dîqet, bi dûzan. Li gora ûsila osmaniyan ko bav, mam û pismamên wî jî her li gora wê ûsilê rîh berdidan, rîh rû vedi-

179

gire. Rû dibe rîh. Ji cênîkekî heta yê din hemû çenge, heta hinarikan hemû rû, rîh e. Rîh mîna palikekê bi rû ve dizeliqe û wî vedigire. Rû di nav boşahiya rîh de winda dibe, rîh derdikeve pêş. Di saraya Osmanî, Dolmabahçe û airaxanê de, hemû kesên ko karên dewletê digerandin, padîşah, wezîr, aqilmend, pispore, paşe, zabît, rîhpalik bûn. Saraya Osmanî, xizmên Celadet Beg jî tê de, der ya rîhpalikan bû.

Lê Celadet Beg bi wê celebê rîh bernedaye. Wî bi ûsila zane û tégihîştîyên aleman û fransîzan rîh berdaye; bi tenê li dora çengê, kin û bi qasî kulmekê. Li pişta wêna yanzdan a vê romanê, bi tîpên latînî û bi jimarên erebî cîh û tarîx hatine nivisîn. Bi tîpên latînî »Sham«, bi jimarên erebî jî hatiye nivisîn. Yanê tarîxa kişandina vê foto grafê 1932 ye. Yanê ji ser 1893-an re ko rûpelên pêşîn ên romana »pê dest pê kiribû, sîh û neh sal bihurîne.

Umrê ko li welatekî nû yê xerîbiyê, ketiye ser riyeke nû û ber bi salên xwe yên çilan dere, welê dixuye, rîh divê... Lê her çi be jî, ji ber çi sebebî be jî, rîh lê hatiye; rû pê ziravtir û bêtir lihevhatî dixuyê, renekî alîm û zanayan pê dikeve. Rîh awayekî europé didiyê.

Defter, kitab, rojname, kovar, pênûs û rîh... Li şamê, navenda medeniyeta erebî, kurdekî zane û europé...

Celadet Beg û masa ko ew li berê rûniştîye, li kêleka çardaxek û bîrekê ne. Li paş Celadet Beg, li milê rastê, dîwarê gulover ê bîrê dixuye. Bîr lêbûyî ye, bi dîwêr. Bi qasî mîtro û nîvekê, bilind bûye. Ji bo kişandina avê, dolabek li dîwêr zêde bûye. Sitîleke ne ewçend mezin li ser dîwêr dixuye. Siya Celadet Beg û masê li dîwarê bîrê xistiye. Siya wî li ser dîwarê bîrê ye. Hema li nik bîrê, çardax, bi caxên fireh û paralel, bilind dibe. çend mêw çardax rapêane û di navbera çavên caxan re hildikişin jor. Bîr û çardax aliyê paş ê fotografa yanzdan tijî dikin.

Rîh li Celadet Beg tê. Bîra lêkirî li »tê... Meriv ji fotografên »jî derdixê ko fotograf texlît bi texlît in. Hinên wan dipeyivin, taswîr dikin û salix didin. Hin diqîrin, diqîjin. Hin jî bêdeng û aram in. Fotografên bêdeng û aram bi tenê hene û li benda dîtin û nêrîna nêrevan in. Dewsa ko ew bipeyivin, hewcedariya wan bi gotin û nêrînen kesên ko li wan dinihêrin, heye.

Ev fotograf jî i vê texlîdê ye; bêdengî û aramî jê hildibe, zelaî û ronahî tê de dixuye. Germahî tê de heye. Ev fotograf napeyive, ji ber ko Celadet Beg tê de dinivîse.

Wî dest bi nivîsînê kiriye.

Min qirara xwe daye, Celadet Beg dibêje, ez ê binivîsim, dest bi nivîsînê bikim. Min dil bi cerîdeyekê, cerîdeyeke kurdî heye.

Mîna her carê, vê êvarê jî, dîsan, li şamê, taxa kurdan, li mala fireh a Elî Axayê Zilfo, civata kurdî geriyaye. êvar, êvareke sar a zivistana 1932-an e. Kesên ko li odê rûniştine, gelek in; ji Celadet Beg pê ve, Haco Axa, tevî hersê kurên xwe Hesên, aeçan û Cemîl, Ekrem û Qedrî Begên Cemîlpaşa, Elî Axayê Zilfo, Bozan Begê şahîn, Osman Sebrî, hevalên Celadet Beg ên Stembolê Memduh Selîm Beg, Hemze Begê Muksî û hîncend kesên d in. şîva ko hertim bi beroşan li ser êgir e, hatiye xwarin, firaq rabûne. Civat qahwa piştî şîvê vedixwe. Qutiya cixarê ji destekî vediguheze destekî din. Ji oda germ dûman radibe. Wexta behs û gotinê hatiye.

Tûrê derd û kul, birîn û keserên kurdan vebûye, wexta qiseyên dijîtî û berberiyên nava wan, xwestek û hedefên wan ko tu carî bi cîh nabin, hatiye.

Celadet Beg li kesên odê dinihêre, ji fîncana qahwê qultekê vedixwe û dibêje,

– Me cerîdeyekê, na ne yek, cerîdenin, divên... Milet bi zimanê xwe, bi xwendin û nivîsîna xwe dibe millet. Bi vî terhî, millet xwe bi medeniyet û miyaseriyê digihînin.

Ew bi hêdîka, gotin bi gotin, dipeyive. Mîna ko ew nivîsareke nivîskî dixwîne, yan jî bendekê dinivîse.

– Belê, millet bi zimanê xwe hene. Yekîtiya millet bi zimên çêdibe.

Yekîtiya zimên jî bi xwendin û nivîsînê, bi yekitiya herfan çêdibe. Ka ev yekîtiyên me, ka yekîtiyên zimanê me? Ka xwendigeh, mekteb, kitab, cerîde û rojnameyên me ko dê van yekîtiyan bînin pê? Ka?.. Em şikest li ser şikestê dixwin, hertim bi hev dikevin, çima? aima birano?

– Mîrê min, gotinên te rast in, Elî Axayê Zilfo, xwediyê malê, dibêje. Kes nikare bibêje ko ev gotin ne di cîh de ne, lê cerîde û rojname jî bi quwetê, bi dirav û zanînê, bi cemaat û nivîsevanan derdikevin.



îcar ez ê jî bipirsim, ka ev li ko ne?.. Em hemû bi çîroka xwe dizanin, kurd fêrî tiştên weha nebûne...

Ekrem Begê Cemîlpaşa cixareyeke pêçayî dirêjî Celadet Beg dike û dibêje,

– Bi gotina Elî Axa ye. Fikra cerîdê xweş e, pîroz e. Lê ew ê çawan derkeve? Mebesta min cerîdeyeke kamil û xurt e. Cerîd eyek ko bikaribe

181

her û her derkeve û bi wî awayî alîkarî li ziman û hebûna me bike. Ez ê çi bikim bi cerîdeyeke welê ko bi tenê hejmarek, du hejmar derketine, lê paşê hêviya xelkê qurmiçandiye û winda bûye!.. Ez dibêjim, gerek e, meriv serê xwe baş bi van pirsan biêşîne, deh caran bifikire û paşê gavekê bavêje...

Gotina Ekrem Beg bû, gotina dostê dilsoz Elî Axa bû; ez ê deh caran bi- fikiriya ma û min ê paşê gavek bavêta... Lê ez ne bi tenê deh caran, heye ko bîst caran, sîh caran, çil caran, pêncî caran, sed caran fikirîbûm. Li Stembo lê, li mala xwedî bîr û bexçe ya bavê xwe, gava min rojname û ko - varên mamên xwe dîtibûn; li Stembolê, gava ez li rojnama »Serbestî« xebitîbûm; di keştiya Kadikoyê de, gava min deftera biçk a Cananê xistibû berîka hundir a çakê xwe û ew dabû ber dilê xwe; li Munîxê, ga- va min bi çend kartolan roj biribûn serî û Bîsmark, Goethe û Nietzsche xwendibûn; li wî gundê Munîxê, gava min û Safo, birayê axretê, şairên frensizî xwendibûn; Li Misirê, li bexç kekê min Sureya, gava min li çavênwestiyayî û kesertijî yên bavê xwe yê nexweş nihêrîbûn û li wesiyeta wî guhdarî kiribû; Li ser tixûban, gava me dirêjî Tirkiyê kiribû û piştî donzdeh saetan, destvala, fedîkar, dîsan, vegeyriyabûn; li Lubnanê, di civîna min a dawîn a partiyê de, gava min li lec û şerên bêkêr ên hevalên xwe temaşe kiribû, hingî, her car, ez fikirîbûm.

Ez fikirîbûm û bi tecrubên xwe jî hîn bûbûm; dermanê cehaletê ne laqelaq û gotinên qelaw ên fiş û paşgotiniyên der û dorê bûn. Derman berhem û eser, afirîn û avahî bûn. Tariya şevê bi qîreqîr,

xirecir û teşqele nediqulipî ser ro nahiya sibê. Bi zanîn û huner, bi herf û hevoka nivîskî dibû.

Ez fikirîbûm... Loma jî gava min kovara xwe weşand, di hejmarek ji yên pêşîn de, min bang li xortên kurdan kir û weha nivîsî; »Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji der ve dijmin dirêjî me kiriye. Ji her milê êrîş. Di hundirê kelê de şerekî din, bê eman û ji yê pêşîn mezin û diwartir heye. Şerê me bi hevûdu re. Di mal de jî dijmin. Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexts e (hesûdî), berberî ye, jana dextsê ye. Em sîngjar in. Ji der ve serma li me dixê. Li hundir em bi janê dikevin...«

Ez fikirîbûm... Me dîsan şikest xwaribû, em dîsan bi hev de ketibûn, dîsan dexesî û berberiyê bîhn li me çikandibû. Fransizan, desthilatên we- latê Sûriyê jî, li ser daxwaza Tiurkiyê, em hemû, axa û beg, şêx û giregir, mîr

182

û rêberên kurd, dabûn hev, ji doraliyên tixûb bi dûr xistibûn û em hemû lişamê civandibûn. Kurdên şamê dîsan, bi mêvanperweriyê rabûbûn û malên xwe ji derketî û nefiyan re vekiribûn. Elî Axayê Zilfo jî deriyên mezin ên mala xwe ya mezin ji giregirên kurdan re vekiribû. Rewş weha nexweş bû. Heçî ez bûm, li ber min du rê mabûn; ya min ê ji welatê rohilatê rû bada û berê xwe, dîsan, bida welatê roava. Yan jî, digel her tiştî, ez ê li Lubnan û Sûriyê bimama, min ê singê konê xwe yê koçer li axa qiraç a welatê ereban daçikanda. Ji welatê roava, Monikayê bang min dikir, name li sername dinivîsî û dixwest ko ez vegeyriyama Alemanyayê. Peikana pepûk a dilşewitî jî name dişandin.

Lê ez fikirîbûm... min ê kovare ke çandî û edebî ya xwerû kurdî biweşanda...

Tevî ko êdî derengê şevê ye, civata kurdî hê jî germ e. Heval û dostên Celadet Beg, yek bi yek, li ser kovarê dipeyivin, dîtin û pêşniyarên xwe dibêjin. Lê bi tenê Haco Axa bêd eng e. Ew tu tiştî nabêje, bi tenê guhdarî dike. aaxa Haco Axa radihêje cixareyekê,

Celadet Begê ko li kêleka wî rûniştiye, hingê, bi heste cixara wî vêdixê û jê dipirse,

– Mamê Haco, tu mezinê me yî. Tu ji me çêtir bi hal û hewalên îmkan û zirûvan dizanî. Ev bû çendîn car ko em vê meselê dipeyivin. Lê ez bala xwe didimê, tu her bêdeng î... Ma tu dîtî, nêrîn û pêşniyazên te nîn in?

– Mîrê min, ev eşq û daxwaza te, best û kela te zimanê min kilît dike. Ez hew dizanim ka ez ê çi bibêjim...

– Helbet, hin tiştên ko tu bibêjî, hene. aima em ê ji nêrînen te yên hêja bêpar bimînin?

– Mîrê min, tu mîrê me yî, ezîzê dilê me yî. Bav û kalên te mîrên ehl û

eşîrên me bûn. Bi serê bavê te, tu divê bizanibî ko ez dikarim, bêyî ko çavên xwe biqirpînim, van hersê lawên xwe li ber te serjê bikim. Tu bi vê bawer be. Lê heçî cerîde ye, heke ez di dewsa te de bim, ez ê dest bi cerîdemerîdan nekim. Tu mîrê kurdan î, lê tu wan nas nakî. Heke tu bi karê kaxiz û cerîdan rabî, ew ê hezar navî bi te ve kin... Aha, tirsê min ev tirs e.

– Lê çima? Ez ê vê cerîdê, ji bo wan, derxim, vî karî ji bo wan bikim. Ez ê cerîdê bikim kursiya wan... aima?

– Naxwe min got, tu wan nas nakî. Bilûra li ber ga çi ye? aira li ber kora çi ye? Ezbenî cerîde jî bilûr û çire ye. Yek-do dostên te yên têgihîştî dê werin, te pîroz b ikin û bibêjin, »aferîn, tu her bijî«, lê bi sedan, heye ko bihezaran kesên cahîl û nîvcahîl jî dê li dijî te bipeyivin. Cerîde dê bibe sebaba gotin û zimandirêjîyê û em ê jî pê qehr bin... Yan na, ez dizanim karê ko tu pê radibî, pîroz e. Ji niha ve, ez te pîroz dikim...

183

3

– De ka em piyanan ji bo Celadet Beg û kovara wî Hawar'ê rakin. Pîroz be, Celadet Beg!

Di destpêka êvareke meha gulanê ya 1932-an de, li şamê, li mala Celadet Beg, heval û dostên wî civiyane û derketina kovara Hawar'

pîroz dîkin. Ji rojan 15'ê gulanê ye, dinya germ û vekirî ye. Hê êvara ronîya şamê dest pê nekiriye. Li esmanan tu ewr naxuyin. Mêvan, nas û dost, bi cil û bergên tenik ên havînê, li hewşa malê, li ser piyan in. Ne xanî bi xwe, ne jî hewş mezin e. Lê hewş serrast e; di navenda hewşê de bîreke xweşlêkirî heye. Devê bîrê bi çend qor kevirên nehît ên ferîşî lêbûye.

Dora bîrê, mîna bexçeyekî biçûk, rengîn e. Giya hêşîn dike, kulîlk û gul vebûne. Li pey bîrê jî, çend mêw xwe li dora caxên textîn ên kepirekî rapêane û ber bi jor bûne. Pelên mêwan, mîna reqaseyeke welatê ereban, bi hêşînahiyeke tarî, li text, cax û dîwêr piçikîne.

Hejmara yekemîn a kovarê îro derketiye, jê hê bîhna çap û çapxanê difûre. Hin ji mêvanan rûpelên kovarê diqulipînin û lê dinihêrin. Li ser masa ko li kêleka bîrê ye, desteke kovar li ser hev in. Li ser masê çend şûşe araq, hin qedeh û di nav firaqine biçûk de penêr, zeytûn û çerez hene.

– Navê kovarê jî pir xweş e, yek ji mêvanan dibêje, Hawar... ev nav pir xweş li halê me û welatê me hatiye. Nav, hawara me ye, qîrîn û gazîna me ye, eger hin bibihîsin!

– Bira, li vê çarîna rûpela sisiyan binihêrin, yekî din dibêje, ev çiqas xweş lêbûye; Hawar hawara we ye/Deng û gaziya we ye/Jîn û zanîna we ye/Werin hawara xwe bin...

– Kovareke kurdan jî, êdî, heye, bi her fên paqij î kurdî. êdî kurd jî ketin defteran.

Belê, gotina Yunis Axayê Sasonê û Mistefa şahîn Begê bû, êd î kurd jî ketibûn defteran: Min hejmara yekê ya Hawar'ê derxistibû. Ew roj, ew ro- ja hanê!.. Ma ev gotinên te yên qels û ji hîsiyata wê rojê pir bi dûr dikarinwê rojê vejînin? Wê rojê ez ji nû ve hatim dinê; zaroka min a yekem hatibû dinê, bavê min, mamên min, b irayê min Safo ji xewa mirinê rabûbûn. Kalikê min Mîr Bedirxan li nik bîrê bû, (wî araq venedixwar), dikeniya û

184

simbêlê xwe badida. Xewna min a salan bûbû rastiya wê rojê; Hawar der- ketibû...

Di her jînekê de hin roj û wextên nemir hene. Her jîn û qeder xwedî rengên xas in. Panzdehê gulana 1932 -an ko bi rengekî çîkesor dibiriqî, ro- jek ji wan rojên nemir ên jîna min bû. Ez bi ser ketib ûm; zaroka xewn û xeyalên min li ser masa kêlek a b îrê li min dinihêrî û dikeniya. Ewçendxweş, ewçend paqij...

Min serê hespê xwe dîsan berdabû, ew taw dida. Hespê min dipekiya, lê îcar ne li çoleke xalî... Ez ketibûm nav cîhana kitab û kovar, xwendin ûnivîsînê... Hingî, piştî civîna min a dawîn a partyê, min xwe hinekî da alî. Min guhê xwe girtin û xwe da karê nivisîn û xwendinê. Bi zanîn, min xwe kerr kiribû, paşgotinî û xirecirên kurdan ko hî xelas nedibûn, hew digi- hîştin min. Cîhana min a germ a kitab û kovaran ji cîhana bêkêr a gotin, xirecir û dex san gelekî dewlemend bû. Wê cîhanê, heyinên wê cîhanê, eşq û afirîna edebî û çandî ruhê min ê şikestî û aloz aş dikirin. Min bi tenê dev ji partyê berneda, herweha dev ji Bêrûdê û şevên wê yên spî jî berda. Ez hatim şamê û li wir, li taxa ko Rûşen û diya wê lê rû- diniştin, bi cîh bûm. Rûşena qed irgir dîsa gihîşte hawara min, wê xaniyekî biçk ê dutebeqe ko jê re mendere digotin, bi kirêyeke erzan, peyda kir. Xanî biçk bû, tê de hema çi bigire, hî têkber nîn bûn. Lê çi xem! Wî têra min, xewnên min û cîhana min a dewlemend a kitêban dikir... Tevî koça min a biçk û nexuyayî ya şamê, min şêweyê jîna xwe jî guhert; ez bûm hevalê şevê, b ûm dostê jîna şevên dirêj û tarî. Xewnên min di hembêza şevên tarî de stariyek dîtin. Tariya şevê bû ronahiya wan, ew q ulipîn ser herfan, di bin çirayeke qels û fedîkok de, min ew reşandin ser kaxizên spî... û ew kaxizên spî bûn rûpelên qewldayî yên Hawar'ê.

Gava min ew hemû rêzên şevên dirêj ên şamê li hev anîn û rûpelên kovarê amade kirin, bi meb esta hedefên kovarê, min pêşgotineke dirêj, bi navê »Armanc, awayê xebatê û nivisandina Hawar 'ê « nivîsî. Hingî ew got- inên hanê ko hin ji hemû ew gotinên ko li dora roniya qels a çirê difiryanû d içirûsîn bûn, hatin û mîna destpêka benda dirêj, li ser kaxizê spî veniştin; »Hawar dengê zan îne ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike.

Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide nas kirin...«

Di wî danê êvarê yê panzdehê gulanê de, can û ruh ketibû wan gotinên şevên tenê û ew rabûbûn govendê. Wan li nas û hevalên hatî tika dikirinko nas û dost li wan guhdarî bikin...

185

Celadet Beg, cixare di nav tiliyan de, bi rûyê geş û çavên biken, dere nik

Haco Axa ko li kêleka masê rawestayê û bi du hevalên xwe re dipeyive.

– Ez hêvî dikim, cerîde bi dilê te ye, Celadet Beg dibêje.

– çawan ne bi dilê min e, mîrê min ê ezîz, Haco Axa dibêje. Te bi ya xwe kir û tu bûyî xwedanzarok. Lê... berî ko tu niha werî nik me, em di nav xwe de dipeyivîn... Te êdî zarokên bi beden û gowde jî divên...

Celadet Beg dikene, kêfa wî ji gotinên Haco Axa re tê û ew bi dengê bilind dikene.

– Na, na... eve zaroka min hate dinê. Eve têra min dike, ew dibêje, hele bila ev zarok bijî, bi ser lingan keve...

– Mîrê min, ji bîr meke; mala zarok tê de şeytan naçe tê de. – Xwedê mezin e, Celadet Beg dibêje û dikene.

4

– Xwedê mezin e, Celadet Beg dibêje û dikene. No, no, monsieur Bedir-Khan, Colonel Rambot dibêje, weha mifikire. Tu pêwendiya vî îşî bi Xwedê tune. Em divê bi tevdîr bin, hûn divê bitevdîr bin... Ma we kurdan bi xwe negotiye, »l'ennemi du père ne devient pas l'ami du fils«?

– Mr. Kolonel, hûn bijîn... di demeke weha kurt de, hûn hînê gotinên kurdî jî bûne! Hûn bijîn... Ez nizamim ka hûn pê dizanin, lê proverbeke me ya di nav jî heye; »le poltron meurt a chaque instant, le brave, une seule fois...«

Celadet Beg li Helebê, li oda serekê duwemîn ê Istîxbaratê Colonel Rambot e. Digel ko serek bi xwe daxwaz kiriye ko Celadet Beg were

Helebê, nik wan, ew tune, ji bo karekî girîng û acîl, çûye Fransê. Serekê duwemîn Mr. Rambot ko berî niha bi qasî salekê hatiye Sûriyê û malbata Bedirxaniyan baş dizane, xebera girîng bi Celadet Beg digihîne; rejîma nû ya Tirkiyê çend zabit şandine Lubnan û Sûriyê da ko muxalifên rejîmê bidin kuştin.

– Me ev îstîxbarat ji cîhekî pêbawer wer girtiye, Mr. Bedir-Khan, Colonel dibêje. Rejîma nû ya Tirkiyê lîsteyeke bi qasî bîst kesan çiriye da ko bikuje û bide kuştin. Navê we, navê yekemîn ê lîstê ye. Ew deh hezar lîra ji bo serê we didin... Hûn dikenin, lê bawer bikin ko weha ye. Berî niha bi sê salan, wan xebereke weha di rojnama Cumhuriyetê de jî belav kiribûn. Hingî hevalên me yê berpirsiyar pê ne bawer bûn, lê îro em pê bawer in...

– Est-ce que je peux fumer ici, chez vous? Celadet Beg ji Colonel dipirse ka ew dikare cixare bikişîne.

186

Li ser pirsê Celadet Beg, Colonel ji nişka ve, ji cîhê xwe radibe, tê nik wî û bi xwe cixareyek îkramî wî dike.

– Bien sur, ew dibêje, bêguman... li min biborin ko min ji bîr kir... Mr.

Bedir-Khan, em naxwazin tiştêkî bi we bibe... em naxwazin pêwendiya me û tirkan xira bibe, em naxwazin pêwendiya me û kurdan jî xira bibe û Sûriyê tevîhev bibe, em naxwazin aştîya ko me bi hezar zehmetî aniye pê, xira be.

– Baş e, kolonel Rambot, ez çî bikim, çî dikarim bikim? Hûn ji min çî dixwazin?

– Bêguman, em nikarin tiştêkî taybetî ji we bixwazin. Lê me diviya vê îstîxbaratê ji we re bigota û rewşa we careke din bi bîra we bianiya... Mr. Bedir-Khan, binihêrin ka hevalên me yê berpirsiyar, berî sê salan, li ser we çawan nivisîne, Colonel dibêje û ji çavika masê dosyekê derdixe, jê kaxizeke berê hazir kirî dide ber xwe û jê dixwîne; »Celadet Alî Bedir-Khan rêberê tevgera kurdî û yek ji rêberên tevgera muxalif a tirkan e.

Eger ne weha be jî, rejîma nû ya Tirkîyê weha dizane û dihesibîne. Navê Bedirkhanan aleke sor e û Mr. Celadet Ali âlemdarê vê alêyê ye...«

Celadet Beg dîsan dikene û pirsaxwe dubare dike, – Belê, lê we negot ka ez dikarim çî bikin?

– Belê min got... em nikarin şîretan li we bikin... lê hûn divê bi tevdir bin... Ya herî baş, bêguman, ew e ko hûn Lubnan û Sûriyê terk bikin. Lê em dizanin ko we niyeteke weha nîn e. Em jî naxwazin we mecbûrî vê yekê bikin. Ez çî bibêjim?.. hertim nerin eynî cîh û deran, hertim ji eynî rîyan merin û meyîn, bi tenê megerin, ji bo tiştên ko hûn dikin, bila wext û saetên we yê diyar nîn bin, nehêlin kesên ko hûn nas nakin, nêzîkî we bin, bila mala we ji aliyê kesekî neyê zanîn, mal biguherînin, jixwe hûn nikarin ber bin aliyê Cizîrê û tixûbên Tirkîyê ve herin, eger hin kes bang we bikin jî, çûyinê ji heşê xwe derxin... Ez çî bibêjim? Lê, Kolonel gotinên xwe gotibûn... Bi zîmanekî nerm û diplomatîk. Kurd ketî bûn, bêgav ketibûn, jîn û cîhana wan bû hepisxaneyek, li her derî serdestên wan, efendî û xwediyên wan hebûn. Li Lubnan û Sûriyê jî fransîzan »xwedîtî« dikirin. Fransîzan dixwestin bi nermahî karê xwe bimeşînin, ne zêde me biêşînin ne jî Tirkîyê eciz bikin. Lê bandûra rejîma nû ya Tirkîyê her li ser me bû. Rejîmê em ji fransîzan dixwestin, xebat û kirînin me protesto dikirin, bi pere, dek û dolaban axayên nezanên kurd 187

dikirîn û bi wan fransîz eciz dikirin, casûs û sîxurên wan her li pey me bûn. Wan bawer dikir ko em bi karên gelekî mezin radibûn! Dengê defê ji dûrve xweş dihat!.. Ji ber vê yekê jî fransîzan rê li me, li her tiştê me digirtin, bernedidan em xwe bilivînin.

Kovara min Hawar bû stîrîheke nû ya çavên neyaran. Kurd an qîmeta kovarê fahm nekiribûn û nivcahîlên ko li der û dora me bûn, dev davêtinê. Lê neyaran girîngiya wê baş fahm kiribûn, ew pê gelekî eciz bûbûn. Kovarê dengê fetisî yê kurdî bilind dikir û di warê zîman û edeba kurdî de gavên nû, pêwîst û girîng davêtin,



bîhn û nefeseke nû dida kurdî. Ev deng diviya bihata birîn. Hesab û plan ev bû...

Kovar ne bi dilê fransizan jî bû. Wan sansoreke dijwar li ser kovarê danîbûn, tevî ko kovar ji siyasetê gelekî bi dûr bû, wan her hejmara kovarê, rêzên wê yên ko di şevên dirêj de li hev hatibûn, kontrol dikirin û piraniya caran hin rêz, hevok, gotin jê derdixistin. Ji bêyî bêdeng qebûlkirinê, min dikarîbû çi bikira? şêrê girtî û ketî yê qefesê dikare çi bike?.. Lê niha, bi got- inên Mr. Rambot, tehdît girantir bû. Mirina ko jixwe her li dora min bû û her carê ezîzekî dilê min dibir diyarê rehetê, niha ketibû pey min. Gava fransizan bangî min kirin û ez, tevî du hevalên xwe, li trêne siwar bûm û hatim Helebê, min fahm kir ko tişteki gelekî cidî li pêşiya min e. Li Helebê, bajarê xweş ê spî, ez çm û li Hotel Centralê bi cîh bûm. Berî ko ez herim nik fransizan, min hin giregirên kurd, asûr û ermenan dîtin. Wan haya minbi tehd îtê gîhandin. Berî ko fransiz bibêjin, wan hevalan, di şiveke yekta ya aşxaneyeke navdar a Helebê de, daxwaza dilê xwe gotin; ez diviya ji Lubnan û Sûriyê derketima û biçma Awrûpayê...

Rast e, eger ez biçûma Awrûpayê, ez ê, heye ku, ji tehdîdan rizgar bûma, ez ê ji xirecir û berberiyên bêwest û bêrawest ên kurdan bi dûr ketima, lê ma min ê bikaribûya kovareke mîna Hawarê li wan deran biweşanda? Eger min bikaribûya biweşanda jî, kî d ê ew bixwenda?.. û umrê min gi- hîştibû çilî. Min ê bikaribûya, careke din, li hember pûk û seqemên bayênxerîbiyê xwe rabigirta? û di ser de, tevî dersên dil û ruh, ez ji Ovidius, yek ji mamostayên jîna min a mihacir, vê yekê jî hîn bûbûm; jîna însan û însaniyetê bi xewn û xeyalan girêdayî bû. Eger însan û însaniyet hê jî, tevî her celeb misûbetê, dijiyan, ew bi xêra xewn û xeyalan bû. şam û şevên dirêj ên şamê bûbûn kozika xewn û xeyalên min ên afirîn û avakirinê. Minhê gotina xwe ya dawîn negotibû, xewn û xeyalên min hê nemiçiqîbûn...

– çavê me, bi teqdîr, li ser xebata we ya li ser zimanê kurdî ye,  
Colonel

Rambot dibêje û gotina xwe temam dike.

– Merci, Mr. Rambot, ez jî alîkarî û nermahiya we teqdîr dikim.

– Mr. Bedir-Khan, sala bê, em ê li hemû dinê salvegera şoreşa Fransê

pîroz bikin. Bi wê munasebetê, em ê li Lubnan û Sûriyê jî hin tiştan li dar

xînin. Em dizanin ko hûn dilsozekî yekta yê şoreşên Franse û ronesansê

1. Em ê haya we pê bigihînin û em hêvîdar in ko hûn ê jî bîn alîkariya

me.

5

– Bi kêfxweşî...

– Bi kêfxweşî... şev e, şeveke dirêj û çiksayî ya taxa Salihiyê ye. şam, bajarê kevnare yê Rohilatê rojeke bi kept û left li pey xwe hiştiye û ketiye xewê. Perda bêdengiyê bi ser şamê de girtiye. Ji dengê deng-

bêj pê ve, bi tenê dengê bayê tenik, ji der ve, tê. Kengê ye? Kîjan wexta

şevê ye?.. Kî pê dizane! şev gihîştiye nîvî, heye ko jê qulipiye jî. Lê tişteki

heye; stêrkên Kerwankuj û Qurux hê neçûne ava, ji pencerê, hê roniya

wan dixuye. û ezana destê sibê hê dest pê nekiriye. Yanê hê bajar hişyar nebûye û wexta xewê nehatiye; hê jî Celadet Beg, di oda jorîn a xênî de,

li pey gotinên ko xwe li hilbîna çira biçûk girtine, ye.

– Bi kêfxweşî, ez ê careke din lê guhdarî bikim, ew dibêje û xwe hinekî

dide hev. Lê tu jî, hinekî girantir, bibêje. Ez pê re nagihêm...

Celadet Beg û dengbêjê wî Ehmedê Fermanê Kîkî, di wextên razanê yên bajêr de, hê jî rûniştine û li stranên kurdî hûr dibin. Ehmedê

Fermanê Kîkî dibêje, gotinên kevn ên kurdî, mîna mercan, li pey hev rêz dike, Celadet Beg jî dinivîse, wan dike tîp, hevok, rêz. Ehmedê Fermanê Kîkî, bi awaz û dengê xwe, go tin, dewr û dewranên jibîrbûyî yên kurdî bi

Celadet Beg digihîne. Ew ê jî wan, mîna rêzên nivisandî, di Hawar'ê de,

bi kurdên heyama salên 1930-an bigihîne.

Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê dewr û dewrandîtî, xwediyê dengê mîna qedîfe, çavên xwe digire, serê xwe, bi hêdîka, dihejîne û dibêje; Dilolo!... Vê sibekê xelkê min î delal ç welatê xerîbiyê...

Kesek li mala tu nîn

e, w'ezê sebra dilê xwe pê bînim... Derdê dilê min pir in, şevê kanûna

şevine dirêj in... Ez ê rabim lêwik li dergûş xînim... Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorînim, bilorînim, bilorîni m... Hêstirê xwînê, ser sê biskê dişê,

hinarê rûka bibarînim... De bajo emrê dilê min pê re...

– Hêstirê xwînê... ez pê re nagihêm... ji kerema xwe, wan herdu rêzên

dawîn dubare bike...

Dengbêj dibêje; hêstirê xwînê...

189

Celadet Beg piştî xwe daye dîwêr, çogên xwe ber bi sînga xwe kişandiye û li ser textê xwe yê r azanê rûniştiye. Wî deftereke mezin daniye ser çogên xwe û bi pênûseke zirav û dirêj gotinên dengbêj dinivîse. çavên wî li ser defterê, guhên wî li ser dengbêj e. Deng û gotinên dengbêj, beden û ruhê wî vedigire, ew pê re dere. Mîna pêlên derya, deng, car bi car, bi ser wî de tên. Mîna qiraxên avê, beden û ruhê wî pêlên dangan werdigirin. Hemû dîqet, hemû bihîstiyariya wî li ser dangan e. Ev deng divê wî wî wî, tu kitekitên wan ji bîr nebin. Celadet Beg divê wan qult bi qult vexwe, sîng û bedena xwe bide ber pêlên wan da ko bikaribe bikeve nav cîhana wan, bi wan re

bibe yek, bikaribe yekîtiyeke abadîn, ebedî û edebî bîne pê.  
Dengbêj li ser textê razanê ko li hember textê Celadet Beg e,  
rûniştiye, çavên xwe girtine û bi dengekî zîz û nerm, dibêje;  
dengan ew li hespekî rewan ê mîrên kurdan kiriye û ew birine berî,  
de şt û zozanên welêt, nik konên eşîr û koçerên kurdan. Ew ji şeva  
reş a şamê çye şeveke ronî a welêt. Di bin şewqa heyveronê de, li  
ser hespê çrokan, ew difire. Wî çavên xwe girtine, guhê xwe daye  
ser pejn û dengên dewr û dewranên eşîran. Bayekî sivik ê destê  
sibê rûyê wî mist dide, bîhnên wext û heyamên koçeran di navbera  
mûyên simbêlê wî

re xwe bi difnên wî digihînin.

Dengbêj dibêje; li ser hespekî rewan, bi leza bayê sibê, di bihur, gelî  
û

newalên tarîxê re derbas dibe...

Celadet Beg jî dinivîse; bi hemû quwet û dîqeta xwe hewl dide da  
ko

leza bayê sibê yên dewr û dewranên bihurî biqulipîne ser gotinên  
niviskî...

şev bû, me bang şevê kiribû. şev hatibû, -ji bo dîlana keserkûr a  
tarîxê, nalîna dewr û dewranan û serhildana ruhê şikestî. Ba bû,  
şevê bang ba kiribû. Ba hatibû, -ji bo hevaltiya dengbêjê Hawarê,  
şahîdiya deng û got- inên kevnare û hevkarîya vejandina gotinên  
mirî. Ba û şev ji kûrahiyên tarîxê, ji pêlên behrên spî û reş û  
bilindahiyên zozanan hatibûn û mîna re- qasa herî bedew a çrokên  
ereb î, xwe li dora dengê Ehmedê Fermanê Kîkî li ba dikirin. Stêrk  
hê jî diçirûsîn û bi kêfxweşî li best û hesta b a, şev û Ehmedê  
Fermanî Kîkî temaşe dikirin. Ronahiya wan, bi qasî mistekê bûya jî,  
ji pencerê, xwe bi rûyê dengbêjê min, hevalê min ê nû yê qederê,  
digi- hand. Rûyê wî, bi ronahiya saf û paqij a stêrkan, mîna rûyê  
zarokekî

190

dergûşê dixuya. Yan jî mîna rûyê lehen gekî wan stran û destanên  
ko wî digotin.

Ehmedê Fermanê Kîkî ko di kovara min de, bi navê »dengbêjê Hawar´«

, bi nav dibû, bi rastî jî, lehengekî ji dinya lehengên stranên bû. Haya wî ji dinê, ji bayê kambax ê felekê nîn bû. Wî nizanîbû ka pere çî ye. çavê wî ne li mal û mulkê dinê, ne jî li hebûn û mîratên însanan bû. Dinya wî stran bû, gotinên stranên bû.

Hê di gera min a yekemîn a 1919-an a welêt de, min navê wî bihîstibû.

Ew dengbêjekî yekta yê eşîr û malmezinên kurdan bû. Lê gava ko min koçî şamê kir, kozika xewn û xeyalên xwe li wê mala dutebeq e veda û dest bi weşîna kovarê kir, min biryarek stand; min û Hawar´ê dengbêjek diviya... aend dengbêjên ko dikarîbûn bibûna dengbêjê kovarê hebûn. Lê ji Ehmedê Fermanê Kîkî çêtir nîn bû. Gava 1929-an, Qedrî û Ekrem Begê Cemîlpaşa ji Tirkiyê daketin bin xetê, wan ji min re, behsa Kîkî kirin. Min dîsan navê Ehmed hildabû... Min da ser şopa wî. Mîna dengbêjên navdar, wî jî xwe spartibû çîyan. Wî dev ji dengbêjiyê berdabû û çûbû li ser xetê, yanê li aliyê Tirkiyê, li gundekî di quntara çîyan de cîwar bûbû. Piştî ko min şop hilda, di şeveke reş de, bi dizî, tevî du xortan, ez hilkişiyam jor, aliyê Tirkiyê û çm gundê wî.

Ew şaş mabû, nizanîbû çî bigota! Mîrekî kurdan, neviyê Mîr Bedirxan, ketibû pey wî, tevî hemû tehlûkan, hatibû aliyê Tirkiyê û jê dixwest ko ew pê re biçya şamê!.. îşê Mîr Celadet ne îşê aqilan bû! Di nav çend saetan de, digel her kitekitê, min jê re behsa hal û hewalê xwe, daxwaz û mirazên xwe kirin. Wî bêdeng li min guhdarî kir. Piştî ko xeberdana min a hinekî dirêj û hinekî hîsî qediya, wî kumê xwe da serê xwe, kulavê xwe avêt nav milên xwe, pêlavên xwe yên q awcîk pê kirin û ji min re got, »De fermo mîrê min, em bikevin rê...« Gava em ê ji derî derketina, wî rahijî bilûra xwe, ji malê bi tenê bilûr girt. Berî ko tav li me hil were, di eynî şevê de, em dîsan daketin binê xetê, aliyê Sûriyê... Hevaltiya min û Ehmedê Fermanê Kîkî welê dest pê kir û heta koça dawîn a axretê dewam

kir. Ji wê şevê û pê ve, gotinên kevn û bijarte yên Kîkî, tevî musîka Osmanî, Mahler û EmûQalsûmê bûn neqşên jîna min.

Ew gotinên Kîkî... ew gotinên zêrhêlî ko diçirûsîn, ko ji xewna sedsalan hişyar dibûn û vedijyan. Ez ê behsa wan jî bikim, behsa wan û bilûra Kîkî... belê bêyî wan, nayê hûnandin...

– Em divê li wan çend r êzên dawîn ko te dubare kirin, dîsan, vegerin...

191

– Bavê min, kalikê pîrika min, Ehmedê Fermanê Kîkî çavên xwe vedike û dibêje, bîhna min çikiya, te bîhn li min çikand... De bisekine, ez hebki bîhna xwe berdim.

6

Mr. Bedir-Khan, de bisekine, ez hinekî bîhna xwe vedim, Madame Rambot bi ken dibêje, merci...

– Merci pour vous Madame, Celadet Beg dibêje û Madame Rambot heta nik mêrê wê dibe.

– Mr. Bedir-Khan, hûn pir xweş dans dikin, Mr. Rambot dibêje, heta niha me ev aliyê we nizanîbû...

– Heyret! îstîxbarata Fransê bi nav e, min jî welê bawer dikir ko hûn bi

her tiştê min dizanin!..

– No, no, ne welê ye, zêde dikin... Her çi be jî, em, ez û xanima min, hevalên din, bi hatina we pir kêfxweş in. Em dizanin ko hûn gelekî qîmet didin şoreş û fikrên şoreşên fransîzî.

– Na, ez qîmet nadim wan... ew perçeyên jîna min in, ez, xwih û birayên min, em bi wan fikran mezin bûn, perwerde bûn. Li Stembolê, li mala me, hem dengbêj û çrokbêjên kurd hebûn hem jî murebiye û mamosteyên fransîz. Em bi çrokên Mîr Mihemedê Hekqarî û yên Lafontaine diketin xew. Na, ez qîmetê nadim wan, ew xewnên min in;

xewnên siyasî û civakî yên biserketin û serfiraziyê, hebûn û însanbûnê...

Merci...

Celadet Beg qedeheke nû ya tijî ya şampanyayê ji garson werdigire  
û

dîsan li koma zabitên fransizan û jinên wan vedigere,

– Bi musada we, ji bo fikrên şoreşên fransizî... Li ser kolana mezin  
a Salihiyê, di salona herî mezin a Sûriyê de, desthi-  
latên Sûriyê, fransiz, salvegera şoreşa Fransê bi baloyeke mezin  
pîroz

dikin. Tevî ko baloyê hê nû dest pê kiriye, salon heta dev tijî ye.  
Zabitênfransiz bi kincên xwe yên paq ij ên eskerî; dîplomatên  
welatên dinyê yên

li Lubnan û Sûriyê, bi smokîn û kincên dîplomatîk ên reş; tucar, kar-  
bidest, zane, ro nakbîr, nivîskar, şêx, beg û merivdewletên Sûriyê,  
bi tax-

imên kincên nû, hazir in. Jin û xanim ên baloyê ko piraniya wan  
ewrû- payî ne, bi cil û bergên rengîn ên salonên moda yên  
Awrûpayê, renekî

taybetî didin baloyê. Her çar aliyên salo nê bi ren gên ala Fransê  
xemiliye.

Orkestrayeke fransizî musîka valsên fransizî lêdixe. Garsonên ereb  
û

192

kurd, di destên wan de siniyên biçk ên xwarin û vexwarinan, li dora  
mê-

vanan digerin.

Celadet Beg, bi kincên nû yên reş, gomlegeke spî û qirawateke xweş  
a

reş, bi porê biriyantîn û şehkirî, hinekî serxweş, hatiye balo yê û  
şoreşên

fransizî pîroz dike.

– Gava ez zarok bûm, Celadet Beg dibêje, hingî kekê min Sureya ko

niha li Kahîrê dijî, li Galatayê, li Mekteb-î Sultaniyê, bi fransizî, dixwend. Rojekê wî du afîşên fransizî anîn û dan min û birayê min Kamuran ko ni-

ha li Parîsê dijî. Min afîşa xwe hilda ser dîwarê oda xwe. Li ser afîşê wêneyeke J.J. Rousseau hebû. Di bin wêna Rousseau de jî darekî mezin û dirêj hebû. Li ser gowda darê bi herfên fransizî, peregende, weha hati-

bû nivisîn; liberté, force, verité, justice, union... Hê jî ew tên bîra min.

Hê jî ew xewnên min in, hê jî xewnên jîna min in.

Piştî gotinên xwe, ew qedeha xwe dîsan dibe devê xwe û wê heta dawî

wedixwe. Bi qasî kêliyêkê, ew li dora xwe, şênîyên baloyê dinihirê û li

zabitekî û jina wî ko li hember wî sekinîne û lê guhdarî dikin vedigere û

bi kîbarî, dîsan bi fransizî, ji jinikê dipirse,

– Madame Krovere, gelo hûn dansekê bexşî min nakin?

– Avec plaisir, jinik dibêje û tê, dikeve milê wî. Ew herdu, bi hev re, ber bi aliyê cîhê dansê derin.

Wê êvarê tu kêmaniyên min ji mêvanên din nîn bûn; b ejn û bala min dirêj(1.85!.. hinekî dirêj!), kinc û lixwekirina min xweş, nû û lihevhatî, serê min, bi bîhna misk û embera jinan û bi konyak û şampanyê, hinekî, mest bû. Min dans dikir, tevî jinên fransiz ên nerm, li gora ahenga musîk û dansa ko min ewçend jê hez dikir, bedena xwe, bi ûsil, dilivand. Min bêriya dansê û şevên welê kiribûn.

Lê wê şevê, di wê baloya şên û geş de, ez ne bawer im ko haya kesî ji

rewşa min a kambax hebû. Bêgavî û neçariyê dîsan nefes li min çikandibû. Ez mîr bûm, »prince« bûm, (di rûpela dawîn a kovarê de jî weha nivîsîbû; Emir Djeladet Aali Bedir-Khan), gerînendeyê kovara yekta ya kurdî Hawar'ê bûm. Lê di berîka min de, pirî caran,



pereyê cixarê nîn bû. Pere nîn bû, ji bo hî tişteki nîn bû. Min hemû bendên kovarê, di şevên dirêj de, bi qelama reş dinivîsîn. Agir bi pêiyên min diketin, pêî hemû dibûn birîn. Lê çare çi bû? Dakîloyeke nû, bi navê Smith Premier, hatibû bazara Salihiyê. Her cara ko ez û hevalên bi min re, daketana sûkê, ez ê biçma û min ê li wê dakîloyê binihêrta. Her car... Lê pere nîn bû ko min ew bikiriya.

193

Rêzkirina rûpelên kovarê gelekî biha bû. Ji ber ko kovar, bi piranî, bi tîpên latînî dihate weşandin û li Sûriyê, kesên ko bi tîpên latînî bizanibûna, nîn bûn. Da ko min bikaribûya buhayê rêzkirina rûpelan hinekî kêmtir bikira, ez bi xwe diçm çapxanê û bi rojan dixebitîm. Min tîp, li gora nivîsaran, yek bi yek, hildiçandin, dianîn nik hev û rûpel rêz dikirin. Carina deh saet, donzdeh saet... aapxana Tereqî ko bi xîret û dilsozî kovar diwe şand, bûbû mala min a duwemîn.

Piştî ko kovar diweşiya, keft û lefteke nû dest pê dikir, dîsan ji bo ko pere nîn bûn...

Wê rojê, berî ko ez biçma baloyê, dîsan, heta êvarê, bêyî ko tişteki bikeve gewriya me, me lezandibû. Hejmareke nû derketibû. Her hejmara me di navbera 500-1000 libî de derdiket. Me nikaribû ew bişanda kitab- firoş û kitabxanên Lubnan û Sûriyê. Fransizan ev li me q edexe kiribûn... Jixwe kesên ko bikaribûna bi kurdî û di ser de jî, bi tîpên latînî, bixwen- dana, pir kêmbûn. Me kovar, piranî, bi dizî, diçandin kurdên aliyê Tirkîye û Iraqê. Lê pere nîn bû ko me bikaribûya zerf û zamk bikirîna û kovar pê bişandina. Ji lewre, me ew dixistin tûr û kîsên cawîn devê wan didurûn û diçandin. Wê rojê jî, ez, Rûşen ko bi xortekî ereb, Omer Malik re, bûbû dest- girtî, lê hê jî dest û piyê min bû, du xo rtên kurd ên hêja û jîr ko hem di ko- varê de dinivîsîn û hem jî aliyê min dikirin, Osman Sebrî û Qedrî Can û dengbêjê kovarê Ehmedê Fermanê Kîkî, li hewşa malê, li

kêleka bîrê, bi şerpezetî, karê kovarê bir serî. şengê, sega min a gurêx, jî li me nobedarî kir!

Lê kesên ko bi vê şerpezetiya me dizanîbû, pir kê m bûn. Xelkê, nemaze

hesûd û dexesên ko li der û dora me bûn û dev davêtin kovarê, welê b aw- er dikirin ko bi telisan pere, ji min re, dihat! Min ê çi bikira? aiyayên bilindbê berf nedibûn, newalên kûr bê av nedibûn...

Celadet Beg û Madame Krovere, guhê wan li ser orkestrê, li gora musîkê

gavên xwe davêjin. Ew napeyivin, musîk û dans tevgera wan bi rê dixê. Ling, tevgera dansê, libabûna bedenên, hilm û germahiya kesên ko dans

dikin, birûyên zirav, çavên kilkirî û lêvên sor ên Madamê Celadet Beg bê- deng dihê. Ew nax waza bipeyive, bedena wî bi x wîdan, kirasê wî yê spî

yê hewrêşimî bi bedena wî ve zeliqî, ew bi dansê re dere...

Lê musîk radiweste.

– Mixabin, Madame Krovere dibêje... Pir spas, ez ê van demên dansê ji

bîr nekim...

194

Celadet Beg, bîhnçikyayî, bi çavan spasî wê dike û wê dibe nik koma zabitan, nik mêrê wê. Koma zabitan û mêrê Madamê li çepikan dixînin... Celadet Beg ji garsonê ko derbas dibe, qedehê nû ya şampanyayê werdigire, bi qedehê silav li wan dike û ji şampanyê vedixwe. Merivekî

navsal, hinekî porweşiyayî, simbêlq ît û zerik, li nik wan e. Ew jî, bi serî,

silav dide Celadet Beg.

– Ez Wehbî Beg bi we bidim nasîn, Loynant Krovere dibêje. Char ge d'affairê Tirkiyê... katibê yekemîn ê balyozxana Komara Tirkiyê... û Mr.

Djeladet Aali Bedir-Khan...

– Memnun oldum, Wehbi Beg dibêje û destê xwe dirêjê Celadet Beg dike. Demek ünlü Celadet Bey sizsiniz...

– Ben de memnun oldum, Celadet Beg dibêje. – Ha, işte bizim haným da geldi, katibê yekemîn dibêje, onu sizinlee

taný

ştýrayý

m, Celadet Bey...

Ji nişka ve, jinikeke gelekî xweş, por dirêj, li kêleka Celadet Beg dixuyê.

Celadet Beg lê dinihêre. Çav

... çavên reş... Ew van çavan dinase, van ji derekî dinase... Lê ji ku?

Bejn, bejn û bal... Na! Nabe!.. Celadet Beg serxweş e, çewt dibîne...

Lê... Belê... belê... ew e;

– Canan! – Celadet! – Canan!..

195

196

FOTOGRAF 12: Evîn; xewna abadîn, bihuşta ruh, lê dûr û nediyar...

1

Sal 1935 e. Li pişta fotografa donzdan a Bîra Qederê, bi jimarên erebî, hatiye nivisîn; Belê, sal 1935, ji mehan sibat, ji rojan yekşemî ye.

Sal diqulipin, umrê Celadet Alî Bedirxan û rûpelên romana Bîra Qederê, mîna her umrê têkel û kozmopolît, carina bi lez, carina aram, digihîjin navenda salên sîhan.

Salên sîhan; heyamên nû, gavên nû, hêviyên nû û derd û keserên nû.

Salên sîhan; dirêjahiya şevên reş, bêdengiya tariya şevê, karkeriya got-

inên mirî û windabûyî yên kurdî.

û tenêtî... di nav xelk, şênî û xisman de tenêtî...

Salên sîhan; biryarên bingehîn ên jiyanê. Di fotografa duwanzdemîn a de du kes hene; Celadet Alî

Bedirxan û dotmama wî Rûşen. Herdu, li kêleka hevûdu, li ser riyekê

sekinîne. Celad et Beg, cixare di destan de, li dûr dinihêre. Rûşen Xanim jî, bi ken, li wî. Dunya sar û seqem e. Ji ber ko hema li pey wan, tişteki kozû bi zû li Rohilata Navîn nayê dîtin, berf dixuyê. Belê, berf... Ew li kêle-

ka rê sekinîne. Rê reş e, lê li pey rê, hemû hawirdor spî ye.

Berfê hawirdor vegirtiye. Tevî ko dinya sar e, ronahiya berfê ger - mahiyekê reşandiye ser fotografê. Ronahî û germahî ji fotografê dixuyin.

Lê rûyê Celadet Beg tu tiştî nabêje. Ew bi awirê xwe yê ko êdî ji bo xwendevanên nas e, li dûr dinihêre. Vala û kûr. û hinekî jî pojînî. Ew li çi dinihêre? Li çi difikire? ai hîs dike? Bêguman, eger zimanê wênê hebûya, wê dê bersîva van pirsan bida. Lê fotograf, mixabin,

bê zar û ziman e. Celadet Beg rawestayê, di nav pêçiyên destê rastê de cixareyeke vexistî, destê wî yê din di berîka pantolê wî de, hinekî stûyê xwe, mîna piraniya caran, xwar kiriye û li dûr dinihêre. Heye ko şaş be,

lê meriv ji rawest, awir û nêrîna wî dikare derxe ko hîsên wî têkel in. Ew

difikire, lê ne li tişteki, li pir tiştan.

197

Celadet Beg, merivê xwediye jiyan û xewnên têkel, di nav hîsên têkel

de ye.

Rûşen Xanim, serê xwe hinekî bilind kiriye lê dinihêre. Bi hez û bi ken.

Ji fotografê baş dixuyê ko Rûşen Xanim ji rewşê razî ye. Ew kêfxweş e.

Wê destên xwe, ji herdu aliyan, ber bi jêr kirine, lingê xwe yê rastê hinekîderxistiye pêş, stûyê xwe bilind kiriye û li pismamê xwe dinihêre. çavên

wê dikenin, ne bi tenê dikenin, ew dibiriqin jî.

Ew ji ko tîn û derin ku? Eger meriv bi çroka vê fotografê nizanibe,

meriv nikare bersiva vê pirsê bide. Fotograf, bi tenê, kurte-dema  
kişand - ina fotografan nîşan dide, wê kurte-demê dike nemir, lê çî  
mixabin e ko

fotograf nikare serpêhatiya wê kurte -dema kişandina fotografê  
bibêjê.

Loma jî meriv divê bi çîroka fotografê bizanibe da ko bikaribe  
fotografê vejîne û zimanekî nîşanê bidîyê. Da ko fotograf bikaribin bijîn  
û dest bi sal-

ixdanê bikin.

Pismam û dotmam li ser riyekê rawestane, ew ji dereke tîr û derin  
dereke din. Belê li piştta fotografê tarîxa kişandina wê fotografê  
nivisîye, lê eger ew nehata nivisîn jî meriv dikaribû ji berfê û kincên  
wan fahm bikira ko wext

çile ye, dinya sar e.

Kincên wan; nîşana wext, dem û salan; nîşana hez, tahm û pîvanên  
wan; nîşana edet û ûsilên wan, nêrîn û pêwendiyên wan.

Celadet Beg paltoyeke boz û giran, Rûşen Xanimê jî mantoyeke spî  
yê

hinekî vekirî li xwe kiriye. Palto û manto dirêj in, heta ber lingan  
dadikevin. Celadet Beg pêşiya paltoyê xwe vekiriye û destê xwe yê  
çepê xistiye berîka pantolê xwe. Pêşiya mantoyê Rûşen Xanimê,  
heta qirikê,

girtiye. Ji bin paltoyê Celadet Beg, taximê kincên reş, kirasê spî û  
qirawate reş dixuyin. Mîna her carê, Celadet Beg, bi gotina  
fransîzî

»kostymeke« reş, gomlegekî spî li xwe kirine û kirawate xwe yê reş  
jî pê ve

kiriye. Rîha wî jî mîna xwe ye; kin, kurt û qut. Porê ber bi paş

ş ehkirî,

simbêl, rîh, kincên taxim, kirawat û palto, hemû, pir xweş, li hev  
hatine.

Hemû bi hev re tiştêkî nîşan didin; rewşenbîrekî heyama xwe, ron- akbîrekî şareza, bîrbir û ehlî kêf, merivekî têgihîştî û serhildar ê koz-

mopolît ko ruhê wî bi rengên têkel hatiye hûnandin.

Herçî Rûşen Xanim e, rawestin, nêrîn, por û cil û bergên wê jî, li- hevhatî ne. Nerîna wê nerm, rawesta wê xweş, lixwekirina wê nû û kincên wê nûjen in. Bejn, bal û bedena wê, li gora ya Celadet Beg, gelekî

kin û hûr e. Lê nerîna wê, bi taybetî nerîna wê, germ û bi şefqet e...  
198

Germahî û şefqeta ko Celadet Beg di welatê xerîbiyê de li pey e, gelo di

nerîna van çavên ciwan de ne?..

2

Germahî û şefqeta ko Celadet Beg di welatê xerîbiyê de li pey e, ge- lo di nerîna van çavên ciwan û reş de ne?..

– Canan! – Celadet! – Canan!..

Celadet Beg Cananê, hevala rojên Stembolê, ber bi xwe dikişîne û wê

hembêz dike. Car bi car. Pihêt. Bi coş û hez.

– Canan, ew dibêje û bi xurtî li çavên wê dinihêre, Canan, çima tu napeyivî? Ev çi hal e, Canan? Ev çi qeder e, çi qedereke teres e!

– Ez çi bibêjim, Celadet, Cecoyê ruh û bedena min? Ma gotin qîma her

tiştî dikin?

Celadet Beg ji stûyê wê radimûse. Lêvên wî yên qelew û şil li ser stû de-

rin û tèn. Destên wî li ser bedena tazî, hêdî hêdî, digerin. Mîna ko dest

dixwazin bedenê, ji nû ve, keşf bikin. Beden jî, li gora tevgera lêv û destan, xwe dilivîne. Hêdî hêdî, bi dûzan, bi hostehî.

– Canan, yara xewnan... Celadet Beg, bêyî ko serê xwe rake, dibêje.

Tu

divê bizanibî, herçend tu dûrî min bûyî, ewçend jî tu nêzî min bûyî.  
Hertim, li her derî. Li Alemanya û Munîxê, li Misir, Lubnan û Sûriyê,  
li her derî, tu li nik min bûyî. çavên min bi xeyala çavên te yên reş  
û şêrîn

dihatin girtin. çavên min bi xeyala bedena te ya spehî vedibûn.

Celadet Beg xwe hinekî rast dike, serê xwe radike û li Cananê, li  
bede -

na zirav, xweş û spî dinihêre. Bi qasî kêliyêkê, ew, bê hereket, lê  
dinihêre, ji serî heta jêr, ji jêr heta jor. Paşê, ew bi destê xwe yê  
rastê lehîfên li ser

textê razanê, bi hêdîka, dadixîne erdê.

– Piştî evçend wext, evçend hesretê... tu tişt divê bedena te  
veneşêre...

tu tişt... nêzîkahî û dûrahiya bedena bêrîlêkirî... Ma tu dizanî ew çi  
agir e, ew çi pizot e ko bi bedena merivan dikeve?..

Celadet Beg, cîhê xwe rast dike, xwe hinekî din nêzîkî Canana ko  
dirêj

bûye, dike, li kêlekê rûdine û bi destê xwe yê rastê bedena wê mist  
dide, destê xwe, hêdî hêdî, li ser bedenê digerîne. û ew li çavên wê,  
li kûrahiya

çavan dinihêre.

– Min tu ji çavên te nas kirî... Tevî ko konyak û şampanyayê ez  
sermest

kiribûm û ewçend xelk li dora me bû, min tu nasî... Ji çavên te yên  
reşik...

199

Gava min çavên te yên ko mîna heyveronê dibiriqîn, dîtin, min tu  
nasî.

Te şekl û şemala xwe guhertiye, por guhertiye, lixwekirina xwe  
guhertiye, lê çavên te yên kildayî her mîna xwe ne, ew  
neguherîne... Lê piştî evçend

salan, ma me dê weha hevûdu bidîta?.. Tu, jina dîplomatekî  
dewletekê

ko li p ey qesta min e. Ez, neviyê Mîr Bedirxan, kurê Emîn Alî Bedirxan, prince Djeladet Aali Bedir-Khan, ko bûye derketî û li welatên xerîb li pey

stariyeke biçk û dozên mezin e!

Welê bû, doza ko ez pê rabûbû m, mezin bû, lê ez muhtacî stariyeke biçûk bûm. Neçarî, feqîrî û bêgavî, dîsan, li dora min bûn. û Canan jî, mîna gula topa axirzemanê, bêxeb er, bêhay, hatibû û di navenda mal, war û jîna min de teqiyabû! Ez û Canan, li welatekî xerîb, li Sûriyê... aîrok dirêj e, pir dirêj. Rûpelên têra vê çroka balkêş nakin. (Rojek ji rojan, eger tu, dîsan, li wan rojan vegeyayî, hingî tu dikarî romaneke xweser li ser vê çroka me binivîsî.) Lê çroka me di nav kor-dîplomatîka Sûriye û Lubnanê û kurdên Sûriyê de belav bûbû... Heke ez kitekitan li aliyekî bihêlim û wer- im ser esasê, kurtebiriya çrokê weha bû; min ji hin heval û dostên x we hinpere deyn kirin û piştî gelek zehmetiyan, Canan hilda û çûm Lubnanê, Bêrûdê.

Du xortên kurdên Lubnanê ko li Bêrûdê, li Uniwêrsîta Amerîkayê dixwendin û gelekî jîr bûn, ji bo me, min û Cananê, li taxa herî xweşa Bêrûdê, Sursokê ko li ser girê Eşrefiyê bû, di o têleke gelekî xweşik de, odeye ke xweş kirê kiribûn. Sursok û Eşrefiye hem pir xweş hem jî pir sakîn bû. Ehlê wan deran jî file û Marûnî bûn. Wan em nedinasîn û haya wan ji me nîn bû. Em li odê bûn, ji bo qesta felekê û fahmkirina do lab û çerxa ko felekê li dora me badabû, em li odê, li ser textê razanê, di nav nivînan de bûn. Me piştî xwe dabû çiya û zinaran, berê xwe jî dabû av û deryan û mehevûdu û bedenên hevûdu, ji nû ve, dinasîn...

– Canan, tu bide qedrê Xwedê, çima hîç deng ji te derneket? Ji Alemanyayê, min nameyên bêhejmar şandin, qesîd şandin... çima te

bersiva min neda? aima tu winda bûyî?

Celadet Beg nefeseke kûr ji cixara xwe dikişîne, dîsan, li çavên Cananê

dinihêre û jê dipirse, pirsan li pey hev dibêje.



– Ma qewlê me ne welê bû ko me dê xwe bigîhanda hev, -digel her tiştî,

tevî her celeb musîbet û belayê?

– Mon cher, Canan balîfa Celadet Beg jî dixê bin serê xwe û dibêje, ni-

200

ha ez çi bibêjim jî vala ye... Qeder...

– Cananê, delalê... çawan qeder? Bi qasî ko ez te dinasim, ez dizanim

ko tu ewçend bi qederê ne bawer î... Qedera çi, Canan?

– Sevgili Ceco... her tişt bi leza birûskê hat. Sala ko tu û Kamuran çûn

û we terkî Stembolê kir, 1922 bû. Piştî çûyina we, rejîma nû ya Mistefa

Kemal Stembol jî bi dest xist. Di 1923-an de jî fermana we a te, birayên

te Sureya û Kamuran û bavê we rabû. Deriyê veqerê li ser rûyê we hate girtin, riya veqera we hate birîn. Ez zaroka sirgûnê me, tu dizanî, bav û diya min muhacîr in. çavê min ji sirgûnê, ji welatên dûr û xerîb, ji

jiyanê nenas ditirse. Tu jî xwediyê dozên mezin û şoreşger bûyî.

Paşiya te birî, pêşiya te nediyar bû. Ez boşnak, tu kurd, zimanê me tirkî, welatê me nediyar... Ez tirsyam Ceco, ez tirsyam... Min bi tîrên xedar ên tirsê

evîna dilê xwe kuşt... kuşt...

Canan herdu destên xwe dibe rûyê xwe û digirî, bi deng, bi qîrîn, digirî...

3

Canan herdu destên xwe dibe rûyê xwe û digirî, bi deng, bi qîrîn, digirî...

– Megirî delalê, Celadet Beg, bi xwe jî kelgirî, dibêje.

– Sevgili Ceco, ma tu bawer î ko meriv dikare her roj bi taya evîne

bikeve, her roj ji yekî nû hez bike? Ez bi taya evîna te ketim, min ji te hez

kir û hew... hew... Piştî te jî min jiyaneke hebû; ez jiyam, zewicîm, ketim nav refên şêniyan, b edena min nêzîkî li bedeneke din kir, destê yekî dinli ser bedena min geriya, bîhn û hilma yekî din ji dora min fûriya... lê evîn

li min heram bû, hezkirineke evînî ji min bi dûr bû, taya evînê, careke din, ruh û bedena min venegirt. Ji ber ko tu hebûyî, di kêrahiya beden, can, ruh û dilê min de tahm, deng û pejnên te hebûn... Ceco... bi dû te re, min fahm kir ko evîn xewneke abadîne, bihuşta ruh e. Bi dû wind-abûna wan re, min ev yek fahm kirin...

– aima, tu çima zewicî, Celadet Beg ji qahwa xwe qultek vedixwe û dibêje, çima?.. û çima bi yekî dîplomat re?

Canan bi destmalê hêstirên çavên xwe paqij dike, bi qasî bîskeke, bi nalîn, li wî dinihêre û paşê nêrîna xwe jê dizivirîne û li derya û pêlên spî yên deryayê dinihêre.

– Ma tu Tirkiyê, welatên şerqê nas nakî? Ez ê çawan bi tena serê xwe

bûma û rehet bijiyama? Ma di civata mêran û simbêlboqan de, jin dikarin weha serbest û tenê bijîn? Min teseliya xwe ji te birîbû, hew baw-

201

eriyaya min bi pêşeroja me hebû. Min kozeke agir berda dilê xwe û biryara

zewacê da... Wehbî nasê bavê min bû, boşnak bû, têgihîştî, nerm, bêdeng

û medenî bû... û wî evîn û hezkirineke xurt jî, ji min, nedipa. Wî tiştêkî

ji jiyana min a bûrî, ji min, nedipirsî. Loma ez pê re zewicîm. û min her tişt, ne bi tenê tu, her tiştê jiyana xwe ya berê terk kir. Weha

hîn çtir bû, ji bo her kesî, her tiştî. Eger tu, di wê şeva balo yê de derneketiyayî pêşiya

min, ev jiyana nû dê, di keser û bêdengiya xwe de, dewam bikira.

Lê tu

derketî û hatî!..

– Tu dibêjî ko Wehbî Bey merivekî nerm, bêdeng û medenî ye... Lê ew

dixwazin min bikujin, bidin kuştin. Wan lîsteyeke kesên muxalif hazir

kirine da ko van kesan bidin kuştin. û di rêza yekemîn a lîstê de navê min

heye...

– Na, Canan li Celadet Beg dinihêre û dibêje, na, ez ne bawer im. Ne Wehbî ne jî yên din tişteki weha nakin. Ne ji vê lîsta ko tu behs dikî, lê

haya min ji lîsteyeke din heye; lîsta kesên muxalif ko diviya biketina ber

efûya ko Mistefa Kemal û hevalên wî difikirîn. Navê te tê de hebû, tunebû, ez nizanim. Lê lîsteyeke wan a weha hebû.

– aîroka efûya wan jî, mîna çîrokên Lafontaine in; derew bû, jê tişteki derneket, Celadet Beg bi ken dibêje û rûyê xwe ber bi deryayê dizivîrîne

û li dûr dinihêre.

Di rojeke xweş a bihara Lubnanê de, danê êvarê, Celadet Beg û Canan, bi dizîka, ji otelê derketine û hatine restoraneke navdar a Bêrûdê.

Restoran li ser girê Minete el Husin e. Ji rojan pêncşemî ye. Celadet Beg û Canan li bexçê hênîkê restoranê rûniştine. Bexçe sakîn e, ji wan pê ve,

çend kesên din, ji wan dûr, peregende, rûniştine. Ji dûr ve dengê tîzê keştiyan tê. Derya şîn, pêlên spî yên derya, lengergeha boş a Bêrûdê û

keştiyên têvel, ji dûr ve, dixuyin. Celadet Beg û Canan ji bo şîva êvarê ha- tine. Li milekî ew dipeyivin û li hev dinihêrin, li milekî jî ew li bergehên yekta yên bihara Bêrûdê dinihêrin; derya mîna xalîeyeke yekrengî yê şîn li ber lingên wan raxistî ye. Şînahiyeke pir xweş, pir boş hawirdor vegir- tiye. Dar, daristan û dehl, bi keskahiyeke boş, hildikişin serê zinar û çiyayên ko dor li pişta Bêrûdê girtine. Esmana bê ewr, mîna perdeyekê li ser şînahiya deryayê, bi regekî şîn ê vekirî, dibiriqe. Lengergeh, naven- da cîhana Lub nanê, mîna dayikeke dilsoz, keştiyên cihê û pirrengî hem- bêz dike, -yan jî wan bi r ê dike. Lengergeh; navenda çûyin û hatinê, oxir û xatirê, nêzîkî û dûrahiyê...

202

Celadet Beg û Canan, zarokên heyamên çûyin û hatinê, hem dipeyivin, hem jî li lengergehê dinihêrin.

Nêrîna me ne bêsebeb bû. Cananê biçya, wê dê, ji lengergehê, xatir ji min bixwesta û biçûya...

Rast e, ji rojan rojêke pêncşemiyê bû. Ew jî ne bêsebeb bû. Her roja pêncşemiyê, keştiyeke nazenîn, spî û dirêj, bi nazdarî, av diqelaşt, pêl di- dan ber xwe û dihat, li lengergehê, lenger davêt û disekinî. Navê wê keştiyê Pierre Loti bû. Belê, xwediyên keştiyê, bi bîrbirineke yekta, navê Pierre Loti, nivîskarê fransîz, dostê welatê Osmanî û yên rohilatê, xwediyê romana »Aziyade« ko min hê di zaroktiya xwe de xwendibû, li keştiyê kiribûn.

Keştiya Pierre Loti, her pênc şemî, ji Stembolê, ji bajarê min ê ko êdî li

min qed exe bû, dihat. Pierre Loti Stembol dianî, bîhna bîra bexç mala me ya Kiziltoprakê dianî, tahma masiyên Bospor û Xalîê dianî, kena Mezo û nêrîna kesertijî ya Dayê dianî. Wê zaroktî û xortiya min, şev û rojên wan û siya jîna min dianî.

Her cara ko ez li Bêrûdê bûm, roja pênc şemiyê, ez dadiketim lengerge-

hê da ko tiştên ko Pierre Loti anîbûn, werbigirim... û piştî çend saetan jî, dîsan, pê re, silavên xwe yê germtirîn ji Stembola xwe ya germ re bişîn- im...

Wê roja ko ez û Canan li bilindahiyên Minet ul Husn rûniştibûn û me li

lengergehê dinihêrî, dîsan, çavê me li Pierre Loti bû. Wê dê, îcar jî, pi ştî hefteyekê, Canan bibira. Ez û wê, bi tamamî, sîh û sê rojan, li oda xwe ya otêlê, bi hev re bûn. Me xwe dabû alî. Herkes li me digeriya tirk li wê, kurd li min, fransiz jî li me herduyan. Kesên ko dizanîb ûn, em li wê otêlê ne, bi tenê sisê bûn; ew herdu xortên kurd ên jîr û dostekî min ê ermen, Mr. Papaziyan ko dostê min ê man û nemanê bû... Bêguman, wan ji kesekî re nedigotin. Heta ji Rûşenê re jî.

Rûşenê bi wî xortê hunermendê ereb, Omer Malik re bize wiciya û ez ê

jî di zewacê daweta wan de hazir bûma. Min jê re soz dabû. Lê ez winda bûbûm!.. Rûşena reben! Ew ketibû pey min, Celadet Amca (yan jî Abî) yêxwe. Wê cîh nehîştibû, li min pirsîbû. Lê erd qelişîbû û ez ketibûm binî. Loma jî, gava ew zewicî, ez ne li nikê wê bûm... (Xwedê dizane, ka hingî min di oda me de çî dikir!...) Xortan xebera zewaca wê bi min gihandibûn. Min, ji dil, serfiraziya wê dixwest. û min dizanîbû ko gava ez ne li şamê bûm, ew diç mala min a şamê, mal dida hev, gul û kulîlkên dora bîra hewşê av di-

203

dan, x warina şengê jê kêm nedikir û danê êvaran Ehmedê Ferman, deng- bêjê min ê ko min bêrî lê kiribû, dibir, digerand.

Me, min û Cananê çî dikir? Em li odê bûn... Bi tenê carina, ji bo xwarinê,

em derdiketin der, yan jî, gava bihna Cananê teng dibû, em di çîn Meydana Şehîdan, taxa ko hemû sînema lê bûn, û me li filmên nûhatî temaşe dikirin. Berî ko em ji otêlê derkevin, me li ko vara

»Réveil« dinihêrî, tê de fîlmeke nû hildibijart û paşê jî, bêyî ko kes me bibîne, em diçûn û diketin salona tarî ya sînemayê. Piraniya caran, me fîlmên Marlene Ditrecht û Greta Garbo hildibijartin. Ji ber ko Canan bi wan dima! Fîlma »Love« gelekî tesîr li me kir. Garbo o tê de di rola Anna Karenina'yê de bû. Garbo bûbû Canan, Canan bûbû Anna Karenina!.. Piştî fîlmê, bîskeke dirêj, Canan giriya. Fîlmeke din ko tesîr li me kir, »Mata-Hari« bû. Serpêhatiya Mata-Harî û bûyerên fîlmê ko di ode û korîdorên dîplomatan de derbas dibûn, dîsan, li jîn û qedera me dihat!..

Ez çi bibêjim?.. Cananê biçya, êw ê li keştiya Pierre Loti siwar bûba û

terkî min, mêrê xwe Wehbî Bey, şam, Bêrûd û welatê germ ê rohilatê biki- ra...

– Canan, ev defter tê bîra te, Celadet Beg dibêje û ji berîka çakête xwe

deftera reş û biçk derd ixê. Te ev dabû min, li Stembolê, li bajarê xortiya

me...

– Celadet... Sevgili Ceco... Tu agir bi kezeba min dixînî...

– Ji roja ko te ev defter daye min, ew hertim li nik min e, ew şahîda jîn

û hesreta min e. Tê de gotinên min, gotinên qels ên serpêhatiyên min û

gotinên yekta yên Ovidius hene. »Para evîndaran bi tenê ev e; dilsojiyeke

bêpayan û kêfxweşiyeke kin û kurt...« Ovidius veba dinivîse, Canan...

– Xwezî her tişt di destê meriv de bûya, xwezî meriv bi xwe bikaribûya

qedera xwe binivîsiya!.. Lê nabe... em çi jî bikin, nabe... Loma jî weha hîn

çêtir e.

– Ez ne bawer im ko weha hîn çêtir e... û ez dizanim tu dê paşê poşmam

jî bibî... lê heke tu niha weha hîn çtir dibînî, bila mîna te be.

– Nabe, Ceco, nabe, ez hew dikarim ji te re bibim yar, hew dikarim li

van deran bimînim, hew dikarim ji bajarê xwe Stembolê derkevîm... nabe... evîndarê ruhê min, nabe...

Celadet Beg bersivê nadiyê, bi tenê ew li dûr dinihêre û guhê xwe dide

ser dengê keştiya ko hêdî hêdî ji lengergehê vediqete.

204

4

Celadet Beg bersivê nadiyê, bi tenê, ew ji pencerê li dûr dinihêre û guhê xwe dide ser dengê bilûra ko hêdî hêdî bîr û heşê wî ji şamê vediqetîne û dibe welêt, welatê xeyalan...

– Ev awaza strana Memê Alan baş e? Ehmedê Fermanê Kîkî bilûra de-

vê xwe, dîsan, dide alî û ji Celadet Beg dipirse, baş e? Bi dilê te ye?

– Pir baş e, pir bi dilê min e, Celadet Beg dibêje û dîsan vedigere ser deftera ko li ser çogên wî ye.

şeva şamê dest pê kiriye. Roj û êvar qulipîne ser şevê. Stêrkên qels şevê,

çiraya reben oda kata jorîn a Celadet Beg ronî dikin. şam radizê, taxên

kêf û henekê yên şamê vala bûne, însan radizên, însaniyet radizê.

Di vê wext û dema razanê de, du însan, du kurdên derketî, mîrekî kurdan û

dengbêjê wî, di hembêza şevê de, bi lorîna bayê bakur ê Zerya Spî, di binronahiyeke pir qels û neçar a çirayeke kevn de, li bilûra hezar salan a kur-

dan dixînin, li bilûra çiya û zozanên welêt guhdarî dikin û bilûra ko nîşana tarîxeke kevnare ye, dinivîsin.

Dengbej li bilûrê dixê; bilûra dirêj, zirav û narîn tê ziman, evîn û evîn-

dariyê, hez û hezkirinê, veqetîn û hesretê, derd û keserê tîne zimên. Pêiyên den gbêj, bi hostehê û hunermendî, li ser qulikên bilûrê digerin; dijîtî û berberî, dexesî û hesûdî, dek û dolab, fîtne û fesadî di navbera qu -

likan de derin û tîn. Mirin di navbera pêçiyên de digere.

Mîrê derketî, gerîndendeyê kovara Hawar-ê, guhê wî li ser dengê nerm

ê bilûrê, pênuş di destan de, li ser kaxizê spî dinivîse; Bilûra min a şîrîn / Tu di sariya sibehê / û hingûra êvarê de / Hevalê bêhevalan, / Destbirayê şivan û dilketiyên î. / Dengê te, / Hêstirên dilên xemgîran, / Silava ji hev-

veqetiyên. / Girîn û zarîna dilketiyên / Tîne bîra min. / Bilûra min tu yî, / Xemrevîna terkeserên dinyayê!..«

Dengbêj û bilûrvan devê bilûrê dibe aliyê rastê devê xwe, herdu lêvên

xwe vedikişîne û bi nefeseke dirêj li bilûrê dixê; dengê bilûrê mîrê tenê û

dengbêjê wî dibe kêrahîyên dewr û dewranan, nik beg û mîran, dawet û dîlanan, şer û pevçnan, nêr û nêrvanan, egîd û şervanan...

Dengê bilûrê wan davêje ser piştê mûyekî ji çîrokên »Hezar û şevekê« û wan

dibe welatê xewn û xeyalan, bav û kalan.

Mîr ji qedeha xwe ya araqê Lubnanê çend qult vedixwe, ji cixara xwe

nefeseke kêr dikişîne, serê xwe ber bi jor dike, bi qasî kêliyêkê, çavgirtî,

difikire û dîsan vedigere ser kaxizê spî û dinivîse; »Dengê bilûra min, / aiyê û zozanên bilind, / Kaniyên bi gul û rihan dorgirtî, / Guhê şikeft û



serê zinaran / Guhdarên te ne! / û sura bayê xerbî / Te di nav pelên darê de digerîne.»

Bilûrvan nefeseke kûr dikişîne û dîsan bilûrê dibe devê xwe û lêdixe; mîr û bilûrvan, tevî dengê bilûrê, li x weşiyên cîhanê, bedewiyên bihu ştê

û xezebên dûjehê dinihirên. Deng, pêl bi pêl, bilind dibe. Axîna evîna

qurmiç, mirazên şikestî, pêl bi pêl, dil û ruh vedigirin. Porê dirêj, çavên

reş ên kilkirî, awirê nerm, bêdengiya evîn û evîndarê, gav bi gav, bi dûr dikevin. Agir bi dil dikeve, pêl bi pêl. çav tînin girtin, xwîn, pihêt, di

damaran de diherike. Dengê bilûrê mîr û bilûrvanê wî hildigire û dibe, bi

firê dixîne.

Mîr rûpeleke nû ya deftera li ser çogên xwe vedike û dinivîse; »Bilûra

min, were em ê / Bi wî çiyayê bilind re / Bi hewa kevin / û bibin cîranê bayên xurt / û hevalê kimtên wan / Yê bi mij û dûman, / û tê de dengê xwe berdî / û zarîna dengê me / Bikeve nav kortal û geliyan / û bê- caniya erdên jêrîn bihejîne; / û pêlên ava heftreng / ên xemzebaz / Nalîna me bigihîne / Deşta Sirûc û Diyarbêkrê; / û beriya mêrxasên

Berazan; / û kalîna berxan, / Tev şehîna hespan / Li me vegeirînin.»

Bilûrvan dev ji bilûrê berdide, bi evîn û rêzdarî, mîna ko zarokekê deyne, bilûrê datîne kêleka xwe, ser textê razanê. Bilûrvan westiyaye.

Ax, ew rojên hanê! Ax, nivîskar ! Ax, nivîsandin!.. Ax nivîsandina bilûrê! Ezniha çi bikim? Li ber bûyerên wan rojan bikevim? Yan jî ez wan rêzên şihîra min »Bilûra Min« bi bîr bînim û kêfx weş bim?

Rêz xweş, lê bûyer, pêwendî û hîsên ko ew rêz diafirandin, nexweş bûn.

Mirin dîsan li dora min bû. Bîhn û hilma mirinê ji nav rûpelên defterên min û rûpelên Hawar-ê bilind dibû; mamê min Xelîl Ramî li Lubnanê wefat kiribû, dostê min, hostayê rojnamevaniya min Mewlanzade Rifat Beg li Helebê miribû. Dostê min ê ezîz, hezkarê welêt, şêx Evdirehmanê Garisî, li ser nimêjê, bi destê nokerên dijmin, hatibû kuştin. Mamê min Evdirehman, xwedî û gerînendeyê rojname yekemîn a kurdan»Kurdistan«, li Stembolê, di nav bédengiyê de dilsoj de, miribû. Hin dost û nasên min ên din li Stembol, Paris, Bêrûd, Serê Kahniyê, Iraq û Îranê miribûn. Evîna min, »donna mia« min miribû. Xewnên min ên rojên bê ko bi neqşên evîna evîndara min ve hatibûn neqîşandin, miribûn. Deftera ko evîndara min dabû min û min kurte-notên xwe tê de dinivîsîn, wînda bûbû û miribû. Ez bûbûm pasevanê mirinê, dilê min bûbû geliyê mirinê. û karê min jî, jixwe, diyar bû; bi gotinên kevn û mirî yên kurdî mijûlbûn! Gava

206

şev dihat û perda xwe ya reş davête ser wextên razan û mirinê, min jî, di bin perdê de, miriyên xwe ji bîran derdianîn û dianîn heş û bîran... bi peyv, gotin û qiseyên mirî...

Peyv, gotin û qiseyên mirî... Ez nizamim çima, lê te heta niha tu carê qala hal û hewalê gotinên kurdî

nekir. Te qala karê min ê wan gotinan jî nekir. Lê belê, derketin û weşand- ina kovara Hawar-ê bi xwe, ji bo wan gotinan bû. Her çawan zêrîngerekî, bi kitekit, li karê xwe hûr dibe, ez jî, welê, bûbûm zêrîngerê gotinên wind- ab ûyî, jibîrbûyî û mirî yên kurdî. Ez, zaro kê muhaciriyê, lawê muhaciran, stembolîyekî kozmopolît ko ji welatê kurdan û kahniya zimanê kurdî bi dûr, di nav ziman û çandên cuda de, mezin û perwerde bûbûm, li şamê, bajarê şevên dirêj, ketibûm pey gotinên kurdî yên bav û kalan...

Niha nayê bîra min ka kî bû, lê di wan rojên min ên Alemanyayê de, min

ji feylesofekî xwendibû, feylesof weha digot; em hatin dinê û jiyana da kovan gotinên ko li ber xeterê ne, ji bo we, xelas bikin. Ev gotin

bûbûn qed- era min û heval û alîgirên min ên Hawar-ê. Ez, kurdê welatê xerîbiyê ko min nikarîbû bi kurdî nameyekê binivîsanda, li şamê, bajarê şevên bêxew, bûbûm pasevanê gotinên kurdî ko li ber xetera mirinê bûn.

Ew diviya nemirana. Gotinên kurdî, zimanê kurdî, diviya winda nebûna.

Pir tişt û heyinên kurdan winda bûbûn û miribûn, bi qewlê Nietzsche, kurd bûbûn jihevketî û derketî. Kurdan bi zimanê xwe nexwendibûn, nenivîsîbûn û perwerde nebûbûn. Ji bilî klasîkên kurdî û hin eserên din, zimanê kurdî î neketibû defteran... û li Tirkîyê, rejîma nû zimanê kurdî, yek- car, qedexe kiribû... Lê ziman, zimanê kevnare yê rohilatê, diviya nemira. Loma jî, hê di rûpelên pêşîn ên kovarê de min weha nivîsî; yekbûna kurdan bi yekîtiya zimanê kurdî çêdib e. Yekîtiya ziman jî bi yekîtiya herfandest pê dike. û min di dûmahîkê de jî weha dewam kir û nivîsî; milletên bîndest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan di- parêzin. Ol yek. Ziman dudo. Lê heke ola milletê serdest û bîndest yek bibe, hingî çek bi tenê ye û bend tenê ziman e... Loma jî ez di wan şevan de ketibûm pey gotinên kurdî; armanc, bendewar, erdnîgarî, bîngeh, ciyok, dehker, dîrok, Jînenîgarî, pronivîs, ferhengok, zimanazîn... û bi sedan, hezaran gotinên din ko yan winda bûbûn û miribûn, yan jî di kûrahiyên stran, çrok û destanên Ehmedê Fermanê Kîkî de veşartîbûn... Loma jî ez ketibûm pey alfabeyeke têkûz, gramereke têkûz û zimanekî têkûz.

Loma jî ez bûbûm pasevanê şevê, mirinê û gotina kurdî ya li ber xetera mirinê û min li stran û bilûra dengbêjê xwe guhdarî dikir.

207

Dengbêj, dîsan, bilûrê dixê destê xwe, wê dibe ber lêvên xwe û dibe bilûrvan; dengê zîz, nerm û xweş ê bilûrê wextan di xê nava hev, dewr û dewrandikevin zikê hev. Wext, dewr, tarîx, bûyer, însan û însaniyet li ser baskên stêrkên hezar salan ên şevên şamê derin û tîn.

Mîr du rêzên rûpela nû ya deftera li ser çogên xwe xêz dike, li derve, li stêran dinihêre û dinivîse; »Bilûra min, binêre û bibihîse! / Roj çava, / Stêra êvarê bû geş / Kolosên çıyan ên gewr / û hewraniyên wan ên sor û zêrîn / Bûne cûn; / û pêlên ava şevê ên reş / Ketine deşt û newalan, / Heta rûyê gir û kepezan. / Di qeraca de / Kevir piyê şevgera dixapînin, / û bêdengiya şevê de / Pêjna lingên mêrxasan tên.

Bilûrvan simbêlê xwe yê spî ba dide, zimanê xwe li ser lêvên xwe dibe û tîne, bi xwezî gewriya xwe şil dike, çavên xwe digire, qirika xwe xwar dike û vedikişîne û bi nefeseke têr, bi aheng, li bilûrê dixwe; geh deng bilind dibe, geh nizm. Dengên cihê yên bilûrê, perde bi perde, xwe digihîne ruhê mîr.

Mîr, çav li ser rêzên nivisî, bi tenê li bilûrê guhdarî dike. Bi tenê dengê bilûrê xwe digihîne wî. Mîr qedeha nîvçe ya araqê vedixwe, rîh û simbêlê xwe paqij dike û dinivîse; »Bilûra min, dengê xwe berde!! / Dinya, mîna zarokekî berşîr / Ket dergûşa xwe; / Dengê xwe berde bilûra min / û jê re bilorîne, xema wê birevîne!! / Bilûra min tu yî!.. Stêr qelstir dibin, rojê nû li ber zayînê ye. Hê ezanê dest pê nekiriye, hê li wan nebûye sibe, lê ji derve deng tên. Di ser dangan re, dengê bilûrê, dîsan, bilind dibe; dengê kesên ko terkî welatê xwe kirine, terkî evîn û evîndarên xwe kirine, di heyamên tarî re derbas bûne, bê cîh û şûn, war û welat mane, xwe spartine şevan, belê dengê wan û siya dengê wan, bi alîkariya Mîr, vediguhezî ser kaxizên spî. Dengê bilûrê li ser kaxizên Mîr difire; »Xemrevîna terkeserên dinyayê; / û li ro helatî dema ko دنیا hiş- yar dibe / Ji me re / Strana azadî û serbestiya Kurdistanê binehwirîne / û dengê wê stranê, bila / Mîna tîrêjên rojê yên p ak û zêrîn / Bikeve nav dil û guhên me / Bilûra min / Tu yî xemrevîna dilketiyên welêt...

5

Mîrê min, Mîr Bedirxan, tu yî xemrevîna dilketiyên welêt, Haco Axa dibêje û bi rêz û rêzdarî kevîrê turba Mîr Bedirxan radimûse. Yê din, Celadet Beg, kekê wî Sureya Beg, Memduh Selîm Beg,

Mistefa û Bozan Begên şahîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Husên Axayê îbiş, Mihemed Zilfo Axa, Mele Ehmedê şûzî, Husnî Berazî û hin kesên din, yek bi yek, tên û turbe tewaf dikan.

Rûşen Xanim û diya wê jî tevî wan in. Rûşen Xanimê keça xwe ya berşîr daye diya xwe û li pey mêran, bi tûlekî reş pêayî, tê û li ser turbê radiweste.

Danê sibeyekê yê bihara 1934-an, neviyên Mîr Bedirxan û hezkarên wî hatine serdana wî. Mîr Bedir Xan di goristana kurdên şamê, Ruknedîn de veşartî ye. Bermaliya wî Rûşen jî, li kêleka wî, li dereke, veşartî ye. Mîna her ciyên din, li şamê jî kurdan xwe spartine çîyan, hilkişiyane sîngên çîyan, piştta xwe dane çîyan û wan li quntarên çîyan, ji Salihiyê, navenda bajêr, hinekî bi dûr, taxek ava kirine. Tax ber bi gopikên çiyê bilind dibe, xanî li ser hev in. Xanî bêdûzan in, mîna koxikan, bi lez ava bûne. Ew ji xaniyan bêtir dişibin konan, ko nê koçeran k o dê di demeke kin de, dîsan, ber bi deverên din, koç bikin.

Lê tax gor û goristanekê heye. Tax li miriyên xwe xwedî derdikeve, wan li nik xwe vedişêre. Hemû mezinên kurdan li goristanê, peregende, bêdûzan, veşartî ne. Ji şêxê terîqeta Neqşîbendî û şairê navdar Mewlana Xalid heta Mîr Bedirxan, hemû di quntarên çiyayên kurmancan de, di xewa ebedî de ne.

– Mîrê me, pîrê me, Memduh Selîm Beg dibêje û li kêleka gorê, li ser totikan, rûdine. Binihêre, em, neviyên te, hemû hatin. Berî niha bi şêşt û şeş salan, te ji vê dinya kambax xatir xwest. Lê ji wê rojê û vir ve, giyanê te yê pak hertim li ba kurdan e, bi wan re ye, ji wan re rêberî dike. Hemû kurd, her kurdekî, dixwaze mîna te be, li ser riya te be. Zane û têgihîştî, mîr û serekeşîr, axa û beg, mele û şêx, gundî û zehmetkêş, têkoşer û şer- van, jin û pîr, herkes d ixwaze li ser şopa giyanê pak ê mîrê xwe be. Tu rehet bijî.

Ji Rûşen Xanim û diya wê pê ve, yên din jî li kêleka gora Mîr Bedirxan rûdinin. Celadet Begê ko li nik kevirê gorê rûniştiye, bêdeng, bi destê xwe yê rastê, giya û nefelên ko li ser gorê hişîn hatine, jêdike.

Kekê wî Sureya ko êdî por û simbêlê badayî spî kirine û westiyayî dixuyê, li hember wî rûniştiye û bi destê xwe axa gorê rast dike.

– Mîrê min ê ezîz, Haco Axa dibêje, bav û kalên min, eşîra Hevêrkan, ehlê Cizîra Botan, bi te re bûn, di xizmeta te de bûn... Bav û kalên min digotine min; tu bi quwet bûyî, xurt bûyî, hêza te qewîn, qilafetê te di şûnê de bû. Rîha te dirêj û şehkirî bû. Tu merivekî sade bûyî, te her

209

gotiye, »Bila ehlê min ziktêr, gundiye min xwediye bixêriye vexistî bin.

Bila şorba nîskan li ser êgir, nan li ser tenûrê, mîh û beran , berx û kahr li ber derî bin. Bila teyr û tûrên me azah bifirin, şêr û pilingên me serbest bipekin... daxwaza me ji Xwedayê Alemîn bi tenê ev e...« Bav û bapîrên min digotin, te ji bilûrê hez dikir, kitabxana te heb û, Birca Belek, qesra te ya navdar, ji alîm û zaneyan re vekirî bû.. Cihû û file, keldanî û êzîdî jî ehlê te bûn. Li ber çemê Dijlê, li qiraxên ava zelal, hertim dawet û dîlan bû. Agirê newrozê ji serê çiyayê Herekolê kêr nedibû. Tu bi şeref û heysiyet bûyî, te ji xwe, ji jin û zarokên xwe, ji ehl û şênîyên xwe, ji war û axa xwe hez kiribû. Te ji Rebê Alemîn û qasîte wî hez kiribû, tu bendewarê wan bûyî. Tu ji go tina xwe re xurt, ji d estê xwe re sivik û şûrê xwe re giran bûyî. Haya te ji dinê û bayê felekê nîn bûye, lê tu mîrê kurdan ê nemir bûyî, mîrê min...

Haco Axa, hinekî, radiweste, li dora xwe dinihêre, ji berîka çakête xwe qutiya cixarê derdixê, cixareyeke pêayî dibe devê xwe û bi hestê vêdixê. û ew dîsan, çavên wî li ser Celadet Beg, xeberdana xwe, bi hêdîka, didomîne, -mîna ko ew li ber xwe bipeyive,

– Mîrê min ê cîhbihuşt, em bi çrok û efsaneyên te mezin bûn, me zariyên xwe bi çîrok û efsanên te mezin kirin. Hê jî gundiye botî li ser te rîwayetan derdixin. Ew dibêjin, tu û Xocê Xizir hevalên hev in, hûn bi hev re li hespên kihêl siwar dibin û derdikevin seyrana welatê kurdan.

Hûn li ser çem û behran derin, hûn dibin hevalên teyrên eylo û sêmîr. Tu li ser hespê xwe yê spî, bi kirasê xwe yê spî, mîna melayke û fêriştan dixuyî. Tu hê jî têtî xewna me. Ji bilî me, neviyên te Sureya û Celadet jî li vir in. Gerek e ko tu bizanibî, em li ser riya xewna te ne...

Em li wir, li ser gorê, welê dipeyvîn... Gotinên me xweş û bêşik di cîh de bûn. Lê te dê halê gora Mîr Bedirxan jî bidîta! Kevirên gorê xwar bûbûn ûyek jî şikestî bû. Axa gorê jê ç ûbû û hema çî bigire gor bi erdê ve bûbû yek. Hezar şahîd jê re diviya ko meriv bikaribûya di nav wê goristana biçk de gora Mîr Bedirxan bidîta... Rêberê kurdî û kurdaniyê bi erdê ve bûbû yek... û k urdekî, ji bo Xwedê kurdekî, aqil nekiribû û gor çnekiribû...

Ez çî b ibêjim?.. Heçî ez bûm, min dikir, nedikir, nikarîbû ew perên pêwîst bidana hev, da ko gor bida çkirin. (Min nedixwest, ji bo vê yekê, ji kesekî jî deyn bikira.) Dawiyê min gor da çkirin; axa pîroz ji Cizîra Botan da anîn, kevirên nehît dan şehkirin, mermerên fireştî dan anîn, hosteyên yekta peyda kirin û li

210

dora gorê xaniyekî biçk ava kir. Gor bû ziyaret, bû meclîs... û roja ko lêki- rina gorê tamam bû, min jî wesiyeta xwe kir; eger rojekê ez bimiriyama û îmkan nîn bûya ko kurdan ez li Cizîra Botan, nik Birca Belek ve şartima, hingî nas û xizmên min diviya ez li ber lingên bapîrê min, Mîr Bedirxan, veşartima... (Mixabin, me gora dapîra min Rûşen Xanima ku, li Stembolê, gava ez hatibûm dinê, bi destên xwe ez şuştibûm, nikarîbû peyda bikira.)

Kî dizane, heye ko rûpelên heta wan rojan jî herin? Em vezerin ser wê roja serdana Mîr Bedirxan. Kekê min Sureya ji Misirê hatibû. Ew demeke dirêj, bi qasî çend salan, li Amerîkayê jî mabû, çbû û hatibû. Wî, li wir, kitabek li ser kurdan, bi ingilizî, weşandibû. Wî bêrî li me kiribû û hatibû. Memduh Selîm Beg ji Antaqayê hatibû. Haco Axa ji welêt hatibû. Yê din jî her yek ji derekî hatibûn; em bûbûn perege de û roj bi roj, ji hevûd u, bêtir, bi dûr diketin. Gerç, bi qewlê kalemêran, cer di riya avê de dişkiya, lê bi min welê dihat

ko em, hêdî hêdî, winda dibûn. Gotinên wê rojê, b êguman, xweş bûn û me pê hewcedarî jî hebûn. Lê belê, qal û behsa xewnên Mîr Bedirxan, bi tenê hêvî bû. Mîr Bedirxan, di gora xwe ya basîd de, bûbû nemir û hêvî. Ew bûbû b edewî û spehîtiya hêviyan. Lê belê ew bi tenê hêvî bû. Hêviyên pêşerojê. Helbet her mirovî, her kesî, her gelî hêviyên rojên bê divên. Lê hêviya min bi xwe, roj bi roj, ji hêviyên rojên bê nedima. Kurdan, hal û rewşa wan cîh li hêviyan teng dikirin, ew difetisandin. Kurdan hevûdu dixwarin, di nav behra dijîtî, berberî, hesûdî û dexesiyê de, nefes li hev û hêviyan diçikandin. ai mix- ab in ko hêviyên rojên bê jî b i vê edeta hevûd uxwarinê û zihniyeta hes - ûdiya bêmane girêdayî bû n. Loma jî xewn û hêvî, bi tenê, mîna xewn û hêvî diman...

Wekî din?.. Wekî din hîç tiştêkî nîn bû. Min dinivîsî, kovara xwe derdixist, rojê sê-çar qedeh konyak û du şûşe araq vedixwarin, bi qasî sîh îskanan qahwe vedixwar û du pakêt cixare dikişandin. Tiştêkî din nîn bû... Lê tiştêkî ko di wan rojan de ez kêfxweş kirim, zaroka Rûşenê bû. Belê, Rûşenê zarokeke mîna topa nûrê anîbû dinê. Keçikek, keçikeke şêrîn. Navê keçikê Huseyma bû. Wê rojê, Huseyma jî bi me re bû, wê jî, cara yekemîn, bapîr û dapîra xwe ziyaret kiribû.

Kesên ko hatine gorê ziyaret bikin, radibin, ji Mîr Bedirxan xatir dixwazin û ji goristanê derdikevin. Rê teng û kort in. Ew, kom bi kom, bi dîqet, ji riyên fetlo ke, ji çiyê dadikevin. Celadet Beg, Haco Axa, Rûşen Xanim û diya wê li pey hemûyan in. Haco Axa dikeve milê Celadet Beg da ko bikaribe bimeşe.

211

– Mîrê min, Haco Axa dibêje, weha nabe, em ê, paşê jî, biştexilin, lê weha nabe...

– ai weha nabe, Mamo? Celadet Beg, bi ken jê dipirse.

– Mîrê min, te dît, kurd dibêjin; mêr bê xweyî dibin, jar dibin; jin bê xweyî dibin, har dibin. Tu pirî jar bûyî. Weha nabe... Tu dê heta kengî bê xweyî bijî? Heta kengî tu dê bi Ehmedê Ferman û şengê re bijî? Weha nabe! em ê te bizewicînin!



– Dîsan çîroka zewacê! Celadet Beg, bi ken dibêje. Naxwe min, gelek caran, gotibû, ez naxwazim bizewicim. şaîrê Sûriyê Ebu-l Alâ gotiye; ez îro bûme qurb anê wan kesên ko ez anîme dinê, lê kesekî din ê nebe qurbanê min.« – Ezbenî, tu Xwedê, dev ji van gotinan berde, dev ji felsefê berde. aîroka sefîre xanimê jî êdî xelas... Salê te li ser çilan e, tu mîrekî kurdan î, tu ne li Ewrûpayê, lê li şamê dijî.

Rûşen Xanim ko li kêleka wan dimeşe, piştgirtiya Haco Axa dike.

– Mam Haco rast dibêje, ji er dê heta ezmanan. Celadet Abî, em divê te bizewicînin. Li der û dorên me keçên zaf rind hene. Ez ê, bi xwe, ji bo te, lê bigerim. He valên min hene, nas û xizmên me hene. Ez ê yeka rind, xwende, biesil û biterbiye bineqînim. Eger ew ne bi dilê te be, em ê li yeka din bigerin. Lê tu divê bizewicî.

6

– Tu divê bizewicî... Berî ko Rûşen Xanim bikeve erebê, ew gotina xwe ya dawîn jî dibêje. Piştî Rûşen Xanimê, Celadet Beg jî dikeve

erebê. Bi dû Celadet Beg re, dostê wî Husniyê Ber azî jî dere û li aliyê pêş, nik şofor rûdine. Ereba nû bi rê dikeve. Dinya sar e, çilê 1935-

an dest pê kiriye. Tişteki ko zû bi zû li deverên Beyrûd û şamê naqewime, îcar, îsal, qewimiye; berf bariye. Berfeke boş hemû doralî vegirtiye. Dinya

spî dike û berf jî, hûr bi hûr, dibare.

Bayê danê sibê kuliyên berfê dide ber xwe û wan li hawê diziîvirîne. Kulî tîn û li pencerên erebê dikevin û dihelin. Celadet Beg ji hundir li kuliyên der ko bi lez dixuyin û winda dibin, dinihêre. Rûşen Xanim jî li

wî.

– Celadet Abî, em çi bikin? Tu bi vê qayil nabî, bi wê qayil nabî... de 212

bibêje em çi bikin?

– Ka te kes nedît... – Tu bi kesî qayil nabî. Celadet Beg bersiv nadiyê, bi tenê dikene û kuliyên berfê nîşanî wê dide.

– Li min bibore, lê jîna merivan ne mîna ya kuliyan e. Ji merivan re mal, mulk, pêwendî, zar û zêç divên, Rûşen Xanim dibêje.

Erebe hêdî hêdî dikeve ser riya Bêrûdê û dere.

Em li ser riya Bêrûdê bûn. Min û Husnî Beg Rûşen dibir nexweşxana Amerîkayê ya Bêrûdê. çavên wê nexweş bûn. Demine kurt ew li wir mabû û niha jî her çar mehan carekê diç kontrolê. îcar em jî pê re çûn. (Diya wê hingê ne li şamê bû, ew çûbû Baxdayê.) Jixwe ez mîna bavê wêbûm! Jixwe gelek kesî welê bawer dikir ko ez bavê wê bûm! Ma enî û bîvilên me jî ne wekî hev bûn?.. Min biryara xwe dabû; ez ê li şamê bimama û bizewiciya ma. Lê Rûşenê hê nizanîbû ka bi kê re.

Tevî ko kincên germ ên zivistanê li wan in, ew dihejin. Sar e, seqem e. Dengê ba ji der ve tê. Rê vekirî ye, lê ji bilî riyê, her der bi perda spî ya berfê hatiye vegirtin. Rûşen Xanim, hinekî din, mantoyê xwe diguvişîne ser hev.

– Rûşen, kizim... Celadet Beg, ji nişka ve dibê. Min qerara xwe da, ez ê bizewicim...

– Celadet Abi! Rûşen bi kêf dibêje, pir baş, pir baş...

– Kizim, ma tu dê nepirsî ka bi kê re? – Bi kê re? – Gava em, li Stembolê, zaro bûn, tu dizanî, me amojnek hebû;

Amojna Stî. Amojna Stî her weha digot; şûr şam, xencer mam û jin dotmam...

– Celadet Abî, pir baş, pir baş... Bi kê re, tu dê bi kê re bizewicî?

– Bi te re! – Bi k

ê..... bi min re? Bi min re?

– Belê bi te re... Lê ji bo gerandina karên zewacê, min kaxiza te ya huwiyetê divê.

– Bi min re? Te gote, bi min re?..

213

– Heye ko çend fotograf jî pêwist bin. Ji kerema xwe, çend fotografan

jî hazir bike...

– Bi min re? Bi cariyet-ul mitbax re? Bi min re?

FOTOGRAF 13: »Romana min divê bi kurdî be, mî-  
na -hezar û şevekê- vebêje, mîna misk û emberê,  
bîndar be û mîna pelên gulekê, rengîn be  
bibîşkuve...«

1

Ew, qehremanê romana Bîra Qederê, li ber masê rûniştiye  
û destê xwe dirêjî kamerayê dike. Rûyê wî tirş, awirê wî sar e. Wî  
devê xwe vekirîye, tiştêkî dibêje. ai?

Kî dizane? Heye ko ew dibêje; bes e, bes e êdî, ev fotografên ko  
dibin

şahîdên jîna min, ê heta kengî li pey min bin û mîna siya min her bi  
min

re bin?

Heye ko ew dibêje; bes e, bes e bikişînin, ez westiyame, min taqet  
nîn

e, dev ji min berdî, bihêlin, ez hinekî bîhna xwe berdîm, hinekî bi  
tenê

bimînim.

Heye ko ew weha dibêje; bes e, ji bo Yezdanê Pak, bes e, ma ev  
kamera,

fotograf û fotografkêşî ji bo min û umrê min ê peregende îcad  
bûye? Ma

her gava ko ez davêjim ê bibe fotografek? Ma we dil heyê ko hûn bi  
fo- tografan jîna min, ji nû ve, vejînin? Ma hûn çima ji min napirsîn  
ka ez

dixwazim?

Wî destê xwe ber bi kamerayê û kesê ko fotograf dikişîne, kiriye û  
diqîre. Ji fotografê dixuye ko ew naxwaze ev fotograf bête kişandin.

Lê fo- tografkêş pê li qumçika kamerayê kiriye, di nav kêliyê de,  
hunera ne- miriyê bi cîh hatiye, fotograf hatiye kişandin. êdî

Celadet Beg çî jî bike

vala ye.

Ew li ber masê rûniştiye. Xwendevanên masê dinasin;  
maseyeke biçk, hinekî d irêj, basîd. Li serê kaxiz, defter, kitab û  
kovar ti- jî. Mîna her carê deftereke mezin û dirêj vekirî ye,  
pênûseke reş û dirêj li ser rûpelên vekirî ye. aend hejmarên Hawar-  
ê li kêleka defterê ne. Mase  
mîna xwe ye. Lê hin tiştên nû li ser masê ne; şûşêyeke dirêj a  
konyaka  
yewnanî Metaxa-yê, qedehê nîvtijî, xwelîdankeke tijî, pakêteke  
cixarê  
ya Lucky Strike, qutiyeke kibrîdê û demançeyek.

215

Belê, demançeyek jî, demançeyeke reş û dirêj.  
Heye ko ji ber vê bergehê, ew eciz e û naxwaze fotografkêş pê li  
qumçikê bike. Kî dizane?  
Rû, por, cil û bergên wî jî tevîhev in. Porê wî yê ko hertim ber bi paş  
şehkirî ye, niha, di vê fotografê 13-an a romana de tevîhev e. Rîha  
wî hatiye û zêde bûye, simbêl dirêjtir e. çavên wî di kortê de ne,  
qermîokên eniya fireh û yên binçavan, niha, kûrtir û pirtir in.  
Herç cil û berg in, bi tenê kirasekî dirêj ê spî dixuyê. Bi tenê ew lê  
ye.  
Bi tenê di vê fotografê de, meriv Celadet Beg bê gomleg, bê qirawat  
dibîne. Qumçikên pêşî yên kiras, heta ber zikê wî, vekirîne. Pirçn  
sîngê  
dixuyin.  
Heye ko ji ber kiras e ko ew destê xwe dirêjî kamerayê dike û  
dixwaze  
rê li kişandina vê fotografê bigire. Kî dizane?  
Her çî be jî, Celadet Beg ji vê fotografê eciz e. Bêyî ko haya wî jê  
hebe,  
fotografêş û fotografê dikişîne û wê kurtedemê jî dike nemir. Vê  
wênê  
ew bêhazirî »pêgirtiyê.« Wêne hin aliyên wî yên şexsî ko zêde  
naxuyin

yan jî nayên zanîn, nîşan did e. Demançe li ser kovaran e, »Hawar«  
û de-  
mançe bi hev re ne. şûşa dirêj vala ye, konyak hatiye vexwarin.  
Cixara  
Lucky Strike ji yên basîd û erzana e. Xwelîdanka tijî dema bihurî û  
cixarên bêhejmar yên kişandî nîşan dide. Mirin, fikr, nivîsîn, afirîn,  
xewn, xeyal,  
bîhtengî, esebiyet, tenêtî, sebir, daxwaz, hêvî û bîranîn li ser masa  
Celadet Alî Bedirxan in.  
Heye ko gava ev fotograf tê kişandin, Celadet Beg li van tiştên ko  
jiyana  
wî rapêane, difikire û loma naxwaze ko kes wî eciz bike. Ew dix waze  
bitenê bimîne, di nav fikr û gumanan de, bi serê xwe be. Heye ko  
ew tiştên  
li ser masa wî huzûr û aramiyê didinê, di wan de ew abadînî û  
ebediyetê  
dibîne? Heye ko tenêtî û têkberên tenêtiyê, pênûs, defter, konyak,  
cixare  
û bédengiya şevê, xewn û xeyalên wî tînin pê û jiyanêke din a  
taybetî ya wî, bi tenê ya wî, ava dikan? Heye ko ew pênûs, ew  
defter, şûşe, îskan û xwelîdank bi hezaran, sedhezaran pêlên ko di  
hundir û ruhê wî de radib-  
in, hêdî hêdî, aş dikan? Heye ko ew derman in? Heye ko bi alîkariya  
wan,  
ew mîna teyrekî dikeve nav ewr û esmanên dewr û dewranan,  
wextan li hev tîne, ji hev dike, wan dineqîşîne û ji wan, mîna  
wêneyên vê romanê,  
wêneyên taybetî derdixe? Heye ko ew hewl dide, li welatekî xerîb,  
di nav  
tenêtiyêke sade de, bibe hostayê xewn û xeyalan?..  
Kî dizane?

216

2

– Kê dizanîbû ko dotmama wî, bi gotina dotmamê, »cariyet-ul mitbaxa« wî, dê bibûya bermaliya wî?

– Min dizanîbû, Haco Axa dikene û dibêje. Na, ne ko min dizanîbû, lê

min texmîn dikir. Te mal û hal diviya. Ji Rûşen Xanimê pê ve, kî dikare

mala te ava, halê te geş bike?

Hemû bi hev re dikenin. Celadet Beg û Rûşen Xanimê Haco Axa û Husnî Begê Berazî, herdu kesên ko alîkarî li zewaca wan kirin, eziman-

dine mala xwe ya nû. Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê malê û kovarê jî, di salona mezin a mala nû de, li nik wan rûniştîye. Pencerên mezin ên sa- lonê ko vedibin hewşa fireh a malê, heta dawî, vekirîne. Tevî ko êdî êvarê

dest pê kiriye û bayekî sivik xwe, bi hêdîka, dilivîne, dinya germ e, pir

germ. Destpêka tebaxa 1935-an e. Şam germ e, dûmana tîna tavê ji şamê û deştên doralîyên şamê radibe. Hema çi bigire hemû golên biçk zuwa

bûne, kahnî û bîr miçîqîne. Havîneke germ a nedîtî nefesê li şamê û merivên bajêr diçîkîne.

Lê li salonê germahîyeke din heye. Kesên ko li salonê, li ser kursiyên ko

ji destên hosteyên yekta yên necarên şamê derketine, rûniştine, bi ken, bi hev re dipeyivin. Li erdê tu tişt ne raxistî ye. Rûşen Xanimê hemû xalê

û mehfûr rakirine û wê salon şuştîye da ko hinekî hênik be.

– Mîrê min, Memduh Begê gote me ko te şîrek nivîsiye û pêşkeşî min

kiriye, Haco Axa qahwa xwe vedixwe û dibêje. Gelo rast e?

– Naxwe Memduh Beg xeber bi we gihand? Celadet Beg dibêje û dikene. Min dixwest ko ez wê, bêyî ko haya we jê hebe, di vê hejmarê nû

ya Hawar-ê de biweşînim, bi qewlê fransizan surprisekê bikim.  
– Ma tu nikarî wê nîşanî me bidî? – aima na, lê heke dotmam rê bide, Celadet Beg dibêje û bi ken li Rûşen Xanima ko li ser kursiya kêleka Haco Axa rûniştiye, dinihêre. Hûn ji min çtir dizanin, bermaliya malê, xwediya malê ye. Herçend ew dibêje ko ew »cariye-ul mitbax« e, lê ew kebaniya malê ye. Rûşen Xanim dikene û radibe ser piyan,  
– Berî ko Celadet Abî tiştêkî din bibêje, ez herim, ew dibêje. Jixwe cîhê min mitbax e.  
Berî ko ew ji salonê derkeve, Celadet Beg, bi ken, gotina xwe digihîne wê,  
– Naxwe, te fahm kir ka ez ê çî bibêjim? Ma ne rast e? Mêr xulamê mala xwe, mêrxas xulamê ala xwe ye... Ma ne welê ye?  
217  
Ew dikenin. Celadet Beg radibe û dere ji ser refekî ji refên salonê yên kitabên defterekê werdigire û vedigere cîhê xwe. Ew rûpelên defterê vedike û di rûpelekê de radiweste û serê xwe jê radike, li Haco Axa dinihêre,  
– Rast e, min ev şîr pêşkeşî we kiriye. Navê şihîrê »Were Dotmam« e.  
Berî ko em bizewicin, min ew, mîna nesîrê, nivîsîbû, lê min qalê nedikir.  
Niha êdî wexta wê û çapê hatiye.  
– Mîrê min, ma tu nikarî wê ji me re bixwînî? – Heke hûn ê eciz nebin? Celadet Beg dibêje û bêyî ko li bersiva wan

bipê, dest bi xwendinê dike; Dotmam welê ye, heta mirov x we nas  
 dikit,  
 mirov umrê xwe xelas dikit... Ez pîr bûme. Di derxika canê min de  
 çil  
 buhar bişkivîne. Qurma bedena min çil zivistan dîtine. Bi sedan ba  
 û b a-  
 hozan ew hejandine, bê hejmar berf û baran tê re çûne... Herwekî  
 dibêjin; ciwanî bizaniya, pîrî bikariya. Lê pesn ji Xwedê re ko hêj  
 ewçend ne pîr im ko nikarim... Wekê ez jî ciwan bûm, simbêl hêj  
 nû avêtî bûn ser lêvên min, dilê min bi hevîniya delalan hildavêt,  
 hon ne yek, ne dudo, ne  
 deh, ne bîst bûn. Kej û gewr, esmer û genimî, bejn bilind û navîn,  
 kinên we jî hebûn... Hon hemî ji min, ji me re bûn, me kîjan  
 bixwesta, ne ew ê, ne mamên me, nedigotin no. Lê min, me  
 hemiyan nizanîbûn. çavên  
 me bi we, bi bedewiya can û giyanê we nediket... Bîhna we ya xweş,  
 rengê we yê geş û birewş tu dibêjî qey ne ji me re bûn. Em p ê  
 nedihesiyan. Me  
 ew nedidîtin... Rojekê, me hew dît, gulistan bê gul, daristan bê  
 bilbil maye... Em di hembêza jinên biyanî, hon di bin çengê mêrên  
 nenas de...  
 Celadet Beg li wir radiweste, serê xwe ji defterê radike, bi qasî  
 kêliyekê,  
 bédeng dimîne, paşê ji pencerê li der, hewşê dinihêre û dibêje,  
 – Ez serê we neêşînim, şîr weha dom dike...  
 Hê wî gotina xwe xelas nekiriye, Rûşen Xanim dikeve hundir û bang  
 wan dike da ko ew herin aliyê mitbaxê, ji bo şîva êvarê.  
 Gelo di saloxdana wî danê êvarê de, tu, niha, hinekî, ne şaş bî?... Ez  
 bawer im, welê nebû. Rast e, min serê xwe ji xwendinê rakir û got,  
 »ez serê we neêşînim...« Lê Rûşen hema hingî nehate hundir. Heke  
 ez ne şaş bim, piştî gotina min, Haco Axa ko gelekî ji xwendina  
 şihîrê memnûn mabû, weha got,



— Serî êşandina çî, Mîrê min, bilakîs, dewam bike, em ê kêfxweş bin...

Ez bawer im, Husnî Beg jî ew testîq kir. Min jî dîsan dest pê kir û şîr xwend. Ne bi tenê carekê. Piştî ko xwendina yekan xelas bû, Haco Axa

218

xwest ko ez wê dîsan bixwînim. Min ew dîsan, xwend. û jixwe, piştî de- meke kurt, ew di hejmara 26-an a kovarê de weşiya.

Ez û Rûşenê zewicîbûn. Me tu dawet û dîlan nekiribû. Ne me quweta di-

ravî hebû ne jî dax wazeke welê. Heçî ez b ûm, mîna ko min di şîrê de gotibû, min çil zivistan dîtibûn, çil bihar di canê min d e bi şkiwîbûn. Heta çil û yek!.. Min tu dawet nedivîya! Lê wê şîrê îlan kir ko em zewicîbûn. Loma ew girîng bû. Heye ko hemû şihîr li romanê nayê û tu jî, ji ber wê yekê, nax wazî wê, bi tamamî, vebiguhezî ser rûpelên Bîra Qederê. Lê ez tiştê bibêjim; ew şîr neynika qedera min bû, yek ji neynikên qedera min bû. Di dawîya şîrê de jî, min weha digot; No! no! dotmam, heyraniya pismam, êd î bes e, hew bibe jina xelkê... vegere, were himbêza pismamê xwe, pax - ila kurmamê xwe... »Vegere« ev ne gotineke rast e. Em nikarin ji te re bibêjin »vegere«. Ji ber ko tu neçûyî, me tu rêkirî. Me bi d estê xwe tu hi- nartî mala xelkê. Himbêza xwe veke, ez ji te re tîm. Min hembêz bike. Min wek mîr, pismam û her tiştê xwe maço bike... Dotmam min ji te re got, ez pîr bûme. Lê pîriyê ez hişyar kirim... Buhar ciwanî ye, zivistan pîrî. Zivistan piştî buharê têt. Di zivistanê de buharên veşartî hene... Herê dotmam were, xwe berde hembêza pismamê xwe. Ez ê ji te re, ji zivistana xwe ya sar, buhareke germ çkim...

Herê, şîrê weha dom dikir... Min hinekî dirêj kir, lê vê şîrê her tişt digot,

êd î ne hewceyî gotinên zêde bûn. Di dawiyê de, piştî ko umrê min ji çilan jî qulipîbû, ez gihîştibûm yek ji dotmamên min ên bêhejmar. Heye ko xwendevanên niha merak bikin û bipirsin ka zewaca

me çawan bû? û ew bibêjin, »ma Rûşen Xanim ne zewicî bû, ne xwedî zarok bû?..« Belê welê bû. Lê zewaca wan bi ser neketibû. Piştî ko Huseyima hat- ibû dinê, wan hew dikarîbû zewac bimeşanda. Omer Malik xortekî hêja û ziravbihîstiyar bû, lê ne li gora Rûşenê bû. aend mehan bi dû Huseymayê re, wî xwest dev ji Sûriyê berde û here Parîsê bixwîne. Min bi xwe alîkariya wî kir. aaxa ew bi rê ket jî, min nameyek ji bo Kamuran nivisî û dayê da ko Kamuran li Parîsê alîkarî lê bikira. Kamuran ko li Parîsê bû, alîkarî lê kir û ew li yek ji xwendegehên hunermendî yê herî baş ên Parîsê, »l-ecole de Boux Arts « da xwendin. Bi çûyina Omer re, Rûşen, tevî keça xwe Huseymayê, bi tenê ma. Hingî diya Rûşenê jî çûbû Baxdayê, nik mêrê xwe yê nû!.. Jineke ciwan, tevî zarokekê, li şamê... ne xweş bû.

Hingî min jî dest pê kiribû û êdî bîr bi qîmet û hêjahiya dotmamam dibir;

99 zarokên bapîrê min Mîr Bedirxan hebûn. Belê, te çewt nebihîst, 99. Gelek ji wan keç. Bi sedan zarokên van 99 bira û xwehan çbûn. Piraniya

219

wan keç. Hejmara kesên mala Mîr Bedirxan gihîşte hezaran. Piraniya wan

keç. Lê tevî vê, mal û malbata Mîr Bedirxan winda dibû. Ji ber ko em diçûn

bi keçên nenasan re dizewicîn. Kesên nenas jî dihatin bi keçên me re dizewicîn. Loma min »Were Dotmam« , bi terhekî ko gelekî bi yêBaudelaire dima û bi devoka Botî, nivisî û tê de qala 99-an, keç û dotma-man, Saadet Abla û Rûşenê kir. Hemû dotmam çûbûn, jîna geş a Stembolê çbû, yar û evîndar çûbûn... Lê li şamê dotmameke têgihîştî, dilsoz û fedekar hebû, mabû. Ma min nikarîbû di zivistana umrê xwe de

hêlîneke germ a buharê pêş keşî wê bikira, pê re hêlîneke weha ava bikira?

Rûşen Xanimê xwarinên taybetî yên erebî çêkirine. Gava Celadet Beg,  
Ehmedê Fermanê Kîkî û mêvan tîn mitbaxê, her tiştê xwarina êvarê, li ser masê, hazir e. Taxima teyfikên zêrhêlî ko Rûşen Xanimê bi mieşa xwe ya yekemîn a mamostayî kirîne, bi ûsil, li ser masê, li gora pênc kesan, rêz kirî ne. Rûşen Xanim cîh nîşanî wan dide. Celadet Beg û Haco Axa li kêleka hev, Husnî Beg û Ehmedê Fermanê Kîkî jî li hemb er wan rûdinin.

–Bira Mîrê min, halê cerîdê çî ye? Haco Axa, gava ko ew rûdine, jî Celadet Beg dipirse.

– Halê cerîdê ne tu hal e, Celadet Beg dibêje, hal, halê gor û goristanan

3

1. Heke weha here, cerîde dê bimire.

Naxwe, min gotibû, heke weha here, cerîde dê bimire. Cerîde mî- na şitilan e, jî şitilê re av divê, ax û tav divê, hunera destên hoste di-

vê. Cerîde jî welê ye; jê re nivîsevan û xwendevan divê, mewzû û babet divê, belavkirin û firotin divê, bazar divê... De ka jî min, rebenê

Xwedê re bibêjin, ev hemû pêdivî li ko ne?

– Gotina te ye, mîrê min, lê heyf bû, alîkarî û xizmetên Hawar-ê bêhe-

jmar bûn, bi gotina we, ew kursiya millet bû.

– Ma heyf û hew! De werin jî min bipirsin... Mîna ko min zarokeke xwe, bi destê xwe xistibe gorê... Hawar-ê ewçend tesîr li min kir. Lê min

hew dikarîbû bidomanda, hew dibû...

Celadet Beg, Memduh Selîm Beg, Haco Axa, Mistefa û Bozan Begên

şahîn û hin kesên din li Helebê, li salona fireh û kevnare ya Hotel Baronê rûniştine. Mistefa û şahîn Began ew ezimandine gund. Piştî bîskekê, ew

ê bi hev re herin gundekî ji gundên aiyayê Kurmênc ko gelekî nêzîkê Helebê ye. aiyayê Kurmênc ko ereb jê re dibêjin »Cebel el Ekrad« dev-

ereke kurdî ye. Zana û rêberên kurdan ê, ji bo çend rojan, bibin mêvanê

220

malên mezin ên aiyayê Kurmênc, mala Dîko, mala Reş Axa û mala Seîdê Mamo.

Gava derd û keser, yan jî kosp û girêkên rojane bîhna Celadet Beg teng

dike, mîna îro, ew xwe davêje derveyî şamê, ber bi gund û çîyan. Heval û dostên ko ew dibîne û dixwaze bibîne, gelekî kêr in. Tevî ko ew, bi

temamî, li şamê bi cîh bûye, zewiciye û bûye xwedî mal jî, ew hê jî xwe

xerîb û derketî dihesibîne. Loma jî hevalên wî, kesên mîna wî derketî û kesên ko ji deverên wî yên kevn hatî ne.

– Lê belê, tiştê ko herî zêde ez diêşandim, kurt û pistên kurdan bû, Celadet Beg cixara xwe vêdixe û dibêje. Hemî zehmetî û dijwarî li milekî, lê berberî, hesûdî, nezanî û paşgotinîyên kurdan li milekî. Zehmetî û di-

jwarî li ser seran û çavan bû, lê hê jî ez tînahîm çima kurd ewçend li hember hevûdu kurt û pist dîkin? Mîna ko min tiştê xirab dîkir yan jî tiştê xirab bi wan dîkir... Xebata min, keda min, xwîdana min, şevên

min ên bêxew ji bo wan bû, ji bo alîkariya wan bû...

– Mîrê min, guhê xwe mediyê, Mistefa Beg dibêje. Benîştê mîrê pîs, çroka mîrê qenc e. Tu bi karekî pîroz rabûyî, eger îro eva hanê fahm nebe, ew ê sibê fahm be.

– Herê welê ye, ez jî pê bawer im. Jixwe loma min karî karê xwe bido-

manda. Lê çima ev bedbînî, zikreşî û dilxirabiya kurdan a li hember hev?

aima?

Haco Axa ko hinekî ji Celadet Beg dûr rûniştiye, ji cîhê xwe radibe û tê, li kêleka Celadet Beg, li ser kursiyeke fireh a çermîn, rûdine. Ew destê

xwe dide ser çoga Celadet Beg û bi ken jê re dibêje,

– Mîrê min, naxwe, min berê jî gotibû, tu kurdan nas nakî. Hin gotinên kurmancan hene ko welê vala û bêsebeb nehatine holê. Ew gotin jî-

na kurmancî ne. Mesela kurmancan bi xwe gotine, giyayê hewşê ji xwediyê malê re tahl e. Aha ev gotina hanê hemî derd û kulên kurman- can ên sedan salan şanî dide. Heke tu yekî xerîb bûyayî û te ev kar ji bo kurmancan bikira, hingî te dê bidîta wan ê çî qîmet bidana karê te. Lê

hezar heyf ko tu kurmanc î! Ma çima kurmanc tu carê bi ser nakevin? Tu alîm î, gerek e, tu pê bizanî. Heke ez li gora tecrubên xwe bibêjim, sebeb

ew e ko kurd dijminê hev in, giyayê hewşê ji wan re tahl e... Sala 1925-

an, gava, rehma Xwed ê lê be, şêx Seîdê gorbihîşt li dijî Jon Tirkên nû ko

hatibûn ser hukim serî rakir, em hemû li dijî wî bûn. Dewsa ko em jî pê re rabûna, me û gelek eşîrên din ên kurmancan alîkariya tirkan kirin.

Tevî ko serhildan fireh û bi q uwet bû, ew şikiya. Ji ber ko giyayê hewşê ji

221

me re tahl bû û me xwe dabû aliyê tirkan! Paşê, piştî ko şêx Seîd Efendî û hevalên wî li Diyarbekirê, di berbangeke hênik de, li pey hev, hatin

xeniqandin, heşê me hate serê me, lê çî feyde! Aha çroka me kurmancan

ev e.

aîroka kurmancan dirêj bû û min jî hê nû, deriyên girtî yên vê çroka dilsojvedikirin. Derî girtî b ûn, derî li kurdan hatibûn girtin. Ronahî diviya, lê ron - ahî li pey deriyan bû. Mîna ko Goethe, berî mirina xwe, gotibû; mehr licht! Hinekî din ronahî... Lê li ku, ji ku, çawan? Li cîhanê, her miletekî, wext ûheyamên cihê hene. Her wext û heyam xwediyê rengê taybetî û cihê ye. Lê belê, ji bo kurdan ev ne welê ye. Wan her, bi tenê, wextek û heyamekheye; nezanî û berberî. Wext û heyama nezanî û berberiyê, bi rengê x we yê reş, bûye qedera kurdan. û vê qederê jî kurd xistine bin qeyd û zincîran, kirine bîndest û xizan, jihevketî û derketî.

Kurd bi derd û keser bûn, Lê wan bi kirinên xwe, bi rengê reş ê nezanî û

berberiyên xwe, derd û keserên xwe zêde dikirin. Min jî, bi derd û keser, di rûpelên HAWAR-ê de behsa derd û keseran dikir û her digot; ronahî. Yanê mehr licht... (Ma tu dizanî ko behsa derd û keseran kirin û gotina wan, derd û kesereke çawan kambax e?..) Lê rûpelên Hawar-ê têr nedikirin. Ma Hawar li hember vê dîrok, wext û heyama reş, qedera xirab, ji bêyî dilopeke hûnik a bîreke miçiqî, çî bû? Hî... Lê min ew dilop jî, bi hezar ûyek zehmetî derdixist; dirav nîn bû, nivîskar nîn bû, xwendevan nîn bû, kiriyar nîn bû, dibistan nîn bû, xwendegêh û kitabxane nîn bû, meraq ûheza xwendin û nivîsînê nîn bû. Heke ez niha bi tenê behsa tiştên tunebûyî b ikim, ew ê ne rast be, hin tişt jî hebûn; sansora fransizan, kurt û pistên kurmancan, diwariyên belavkirinê, (carina hin kurd ji Iraq û Tirkiyê dihatin, me jî ko var didan wan da ko bi dizî, bibin wan deran), daxwazên bêhejmar ên kurmancan... Herê, Hawar d i bîreke miçiqî de dilopeke ava hênik bû. Lê min û hevalên min, Rûşen jî tê de, hew dikarîbû. Hejmara dawîn a 26-an ko tê de şîra min »Were Dotmam« jî weşiya, tu yeqîn bike, bi zêrên Dotmamê, derket. Wê rojê, li Hotel Baronê, min şerm kir ko ez qalê bikim, lê

heke Rûşenê, bi fedakariyeke mezin, zêrên xwe nefirota û heqê çapê neda, hejmara dawîn ê derneketa.

Hatina me nîn bû, em ne dewlemend bûn. Carina min diçû û di dadge-

han de awu katî fikir. Carina jî tercumevaniya fransîzî. Rûşenê jî mamostahiya erebî fikir. Hatina me bi zehmetî têra malê fikir. Zêdeyê wê nîn bû. Nav mezin bû, lê tiştê li ber destan nîn bû. Ji ber vê yekê, min têk-

222

berên malê û zêrên Rûşenê difirota da ko kovar derbiketa. Axir... Roja ko kovar derket û min e w anî malê, ez mîna zarokan, dîsan, şên û kêfxweş bûm; zarokeke nû jî hatibû dinê. Min ew nîşanî Rûşenê da. Rûşenê lê ni- hêrt û ez pîroz kirim. Lê wê weha jî got; Celadet Abî, heta kengî? Hetakengî tu dê bikaribî li ber xwe bidî?.. Me, bi şîn û keser cîhek, di dilê xwe de, veda û Hawar xiste gorê. aîroka

Hawar-ê ko sê sal, sê meh û sê rojan domandibû, mixabin, mîna gelek çrokên din ên qedera kurdî bi dawî hatib û... Aha, çroka Hawar-ê jî weha bû ko gelekî li çroka Haco Axa dihat.

– Mîrê min, kî çi dibêje, bila bibêje, te bi ya xwe kir û mucela xwe derx-

ist, Memduh Beg ko taximekî kincên nû, tevî kirasekî spî û qirawetekî

hewrêşimî, li xwe kiriye, destê xwe dibe ser simbêlê xwe û dibêje.

Ma te

nedixwest ko xewna xwe biqulipînî ser rastiye? Ma te her nedigot ko

xewnên me rastiya jîna me ye? Heta te bi xwe li dereke weha nenivîsîbû; bi tenê xewn dikare zora wextê bibe, gava şevên me, xewn û xeyalên şevên

me xelas bin, êdî hûn bizanibin ko em jî xelas in?

Hingê, hê xeberdana Memduh Beg neqediyaye, Bozan Begê ko ji bo

kêliyê ji hotêlê derketibû, dikeve salonê û tê nik wan. Li pey wî jî du kesên din ên bi şal û şepik hene.

– Em divê rabin, Bozan Beg, bêyî ko rûne, li pê, dibêje. Rêberên me jî

hatine. Cîp li ber deriyê hotêlê hazir in. Berî ko êvar dakeve, divê em

herin. Li gora ko rêber dibêjin, xezal û bet jî li doraliyên Kurdaxiyê hatine

4

dîtin. Eger wergî be, em ê herin seyd û nêçra wan jî.

Niha jî dora seyd û nêçîra hevok û cimla kurdî ye. Hevok û cimla kurdî ko Celadet Beg jê re navekî nû dîtiye; komek... Wext, wexta lihevanîn û rêzkirina komekan e. Êdî wext hatiye ko Celadet Beg komekên kurdî yên qedexekirî bîne zimên û wan bide axaftin, ruh û jiyanê nû bide wan.

Hawar hew derdikeve, ew di kêrahîya dilê Celadet Beg de û li ser refên mala wî radizê. Heye ko ew, careke din, ji xewê hişyar be. Celadet Beg li hêviya wê rojê ye. Lê niha ew di xeweke şêrîn de ye. Tevî vê yekê, Celadet Beg dixebite, dinivîse, lêd igere. Bi alîkariya kovarê, ew gihîşte hedefên ko wî dabûn ber xwe. Wî kovareke xwerû bi zimanê kurdî derxist, tê de al- fabeya xwe ya nû ya latînî ceriband û hêdî hêdî ew kir bingeha nivîsîna kurdî, qayideyên nivîsîna kurdî anîn pê, folklor û zargotina kurdî berhev

223

kir û berhemên edebiyata devkî di kovarê de weşandin, hîn şaîr û nivîskarên nû yên zimanê kurdî derxistin, bendên celebên cihê nivîsîn, şîrên xwe weşandin, ayet û hedîsên ola îslamê, bi wergera birayê xwe Kamuran, di rûpelên kovarê de weşandin... û wî hîn gelek tiştên din ên nivîsîna kurdî serast kirin.

Niha jî wext hatiye ko ew komekên kurdî, bi neqş û rengên cihê, bi hev



ve girêde, wan bihûnîne. Yanê ew dixwaze romaneke binivîse û romana kurdî ava bike. Wext li vê xwestekê tê. Tevî ko ewrên reş esmanên dinyayê vegirtine, dinya hê jî aram û sayî ye. Barana reş hê d est bi barînê nekiriye. Piştî Hawar-ê, wî niha bêtir wext jî heye. û ya herî girîng, zarokek li rê ye. Gerç ko var ketiye gorê, lê Rûşen Xanimê mizgînahiya zarokekî nû daye wî; ew li hêviya zarokekî ne. Celadet Beg ê bibe bav. Zirbavê Huseymayê dê di demeke kurt de bibe bav jî û tevî Rûşen Xanimê, ew ê bira yan jî xwehekê yadîgarî Huseymayê bike. Piştî ko Rûşen Xanimê xebera pîroz bi Celadet Beg gihandiye, wî jî Rûşen Xanim û Huseyma wergirtiye û hatiye Lubnanê. Ew niha li Bêrûdê ne, li taxa Qesra Mezin ko li ser girekî Bêrûdê ava bûye, li pan-siyo neke paqij û bêdeng. Zerya Spî û hemû Bêrûd li ber lingên wan e. Ji wan hinekî bi dûr Qesra Mezin ko navenda karên siyasî yên Lubnanê ye û dilê fransizan li wir hildavê, bi hemû bedewiya xwe, dixuyê. Dar û ber, dahl û daristan, mîna xalîçeyekê, raxistî ne. Bêrûd, gencîneya Rohilatê, ko hemû dewr û dewran, hemû rengan, ziman û olan hembêz dike, mîna her carê, niha jî, hembêza xwe ji Celadet Beg û mala wî re jî vedike. Celadet Beg, Rûşen Xanim û Huseyma di qata duwemîn a pansiyonê de ne. Ji ber tevdîrên ewlehiyê, wan qata diduyan xwestiye. Qata wan ji du jûran, mitbaxeke biçûk û saloneke teng û dirêj tê pê. Lê şaneşîna qatê,

bi serê xwe, hêjayê her tiştî ye. Bergeh û dêmenên şaneşînê bêpayan in.

Mîna vî danê êvarê.

Ji der û dor bîhna axê û dar û ber difûre. Li milê çepê yê şaneşînê, li ser

çiyar, keskesoreke zêrhêlî, bi hemû rengên xwe, dibiriqe. Berî niha bi

bîstekê, baraneke boş b i ser girê Qesra Mezin de hat, bi qasî kêliyekê barî

û winda bû. Niha çiya bi rengên keskesorê diçirûsin.

Lubnan û Bêrûd bi rengên keskesorê diçirûsin. Hêvî ji Lubnanê difûre.

Ew grewên karker, esnaf û parêzgeran, serhildanên kesab, goşkar û necaran, şer û pevçên gel û terîqetan rawestayê. Jiyana aborî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Jiyana siyasî nermtir dibe. Li Fransayê, pi ştî helbijartina

gi ştî, hikumeteke nû ya êniya Gel, bi serekiya Leon Blum, hatiye ser 224

hikum. Piştî guherîna hikumeta Fransayê, li Lubnanê jî helbijartin çbûye û serekekî nû yê lubnanî, (ne fransîz), Emile Eddé hatiye hilbi- jartin. Tevî ewr û baranê, dinya nerm û germ dibe. Rengên keskesorê dixuyin.

Celadet Beg ê, di dara dinê de, cara yekî, bibe bav, bibe xwedî zarok.

Ji

niha ve, wan nav jî hazir kirine; eger zarok kur be, nav ê bibe Safter, eger

ew keç be, navê bibe Sînemxan.

Ma ji wê rojê xweştir roj heye ko meriv dest bi romana kurdî bike? Celadet Beg li şaneşînê rûniştiye û weha difikire. Wî masa portatîf vekiriye, pêşgîrekî fireh avêtiye serê, teyfikeke tijî meywe d aniyê ser masê,

devê şûşa araqa lubnanî vekiriye, îskan dagirtiye û difikire; niha jî hû-

nandina gotin û komekên kurdî divê, romaneke ronî divê.

Berî ko ez gotinê bînim ser romanê, divê ez çend tiştên biçk ko te ji bîr kirin, bibêjim û bi bîra te bînim.

Yek; me hin tiştên din jî di Hawar-ê de li dar xistin; kitêbxana Hawar-ê û

di rûpelên kovarê de beşekî fransizî. Di bin sernavê »Kitêbxana Hawarê« de, min hin kitêbok weşandin û belav kirin. »Rêzana Elfabiya Kurdî« û »Rûpelnine Alfabê« dudo ji wan kitêbokan bûn.

Bi alîkariya wan, kurmanc xwendin û nivisîna zimanê xwe yê madêrî hîn dibûn. Heçî b eşê fransizî bû, min gelekî bala xwe dida pêwendiya zimanê kurdî û cîhanê. Min dixwest fransiz û ewrûpayî jî di warê ziman, edebiyat, çand û heyinên kurdî de ser- wext bûna. Bi xêra wî b eşî, me gelek pêwendiyên hêja û bikêrhatî anîn pê.

Dudo; di wê navberê de min du kitêb nivîsîn. Yek bi fransizî, yek bi tirkî.

Yek bi navekî mustear, yek bi navê min. Ya fransizî ko min hê di sala 1930- î de, gava ez yek ji serekên Xoybûnê bûm, nivîsî, li Kahîrê, bi alîkariya kekê min Sureya, derket. Kitêbê ko navê wê »La question kurde, ses origines et ses causes« bû, tê de gelek ag ahiyên bingehîn hebûn û min bi navê »Dr. Bletch Chirguh« nivîsîbû, ez bawer im, gelekî alîkarî kir ko dinya kurdan, hinekî, ji nêz ve, binase. Kitêb a diduyan ko min nivîsî, di esasê xwe de, nameyeke dirêj bû ko min ji serekê Komar a Tirkiyê Mistefa Kemal Paşa re şandibû. Min ew kitab jî sala 1933-an, piştî ko min dev ji Xoybûnê berda, nivîsî. Rejîma nû ya Tirkiyê siyaseteke ecêb dimeşand. Li milekî wê her tiştê kurdî û kurdaniyê qedexe dikir û kurd jî mîna tirkan dihesiband, lê limilekî jî behsa efûyeke giştî dikir. Ev celeb siyaset şaş bû, nêrîn vajî bû. Li ser daxwaza heval û dostan jî, ez rûniştim û min nameyeke dirêj ji Mistefa Kemal Paşa re nivîsî. Min û wî hevûdu baş dinasî. Wî mal û malbata me jî

baş dinasî. Ji malbata me ya fireh hin kes jî bûbûn mişawir, wezîr û berde- vkên wî yên girîng. Min nama xwe, bi tirkîyekî paqij û ûslibeke nerm, bi

navê »Türkiye Reiscumhuru Gazi Mustafa Kemal Paşa Hazretlerine«, nivîsî

û jê re şand. Name nerm, lê rexneyên tê de gelekî hişk bûn. Min di namêde, tevî hebûn û dewlemendiyên ziman û heyina kurdî, şaşiya siyaseta»turkizasyonê « nîşan dida û weha digot; »Paşa hazretleri, heke hûn dixwazin girêka kurdî çareser bikin, hingê rê heq û hiqûq e, ne kuştin, qedexekirin û înkare.« Wê nama ko min di heyştê kanûnîsaniya 1933-an de xelas kir, di nav kurd û tirkan de deng da. Lê li milê din wê riya vegera welêt û Stembolê, ye kcar, li min girt. Ez hew dikarîbûm, bi keştiya Pierre Loti biçma Stembolê, min careke din, Bospor, Kadikoy û Galata bidîta.

Min xewnên weha hew diviyan... (Lê kî dikare rê li xewnan bigire? Min bir-

yar dabû, lê xewnan li min guhdarî nedikirin, ew dihatin, wan ez dibirim Bospor, Kadikoy, Kiziltoprak û Galata yê...)

Niha em vegerin ser romanê. Piştî van kitêbên ko min qal kirin, Hawar û

kitêbxana wê, êdî wext hatibû ko min bikaribûya romaneke kurdî jî binivîsa. Hê li Alemanyayê, gava Monikayê, piştî şeveke dirêj, serê xwe datanî ser sînga min û di xew re diç û ez jî vedigeriyam nav rûpelên »Janên Wertherê Xort« a Goethe, hê hingê, min ji xwe dipirsî; »Ma kurd ê kengî dest bi nivîsîna romaneke weha bikin? Ma ez nikarim biceribînim?..« Piştî salên dirêj û şevên bêhejmar ên dirêj, êdî wexta ceribandîna hatibû. Min ê dest bi romana x we bikira. Min ê çi binivîsa, qala çi bikira? Min, bi qewlê kurdên behdînî, bi misogerî, nizanîbû. Lê min dixwest ko romana min bi kurdî bûya. Ew ronî bûya. Wê qala derd û keserên dîrokî yên kurdan bikira, lê ronî û bi hêvî bûya. Wê, mîna çrokên şehrezadê yên »Hezar û şevêkê« vebigota, jê bîhnên cihê yên misk û emberan

bihata, mîna keske- sora wê rojê rengîn û pirengî bûya. û mîna pelên guleke sor, ew, pel bi pel, bibiškoviya.

Roman geşî û dewlemendiya zimanan, bîhn û tahma civatan bû.

Zimanên ko xwe bi romanên gihandibûn, hew dîmirin. Roman, heke ez bi gotina bav û kalan bibêjim, hespê rewan û beza yê edebiyatê bû. Min roman diviya.

Celadet Beg qedehê dibe devê xwe û heta dilopa dawî, wê, bi carekê, lê hêdîka vedixwe. Paşê jî ew serê xwe radike û li doraliyê dinihêre. Hemû tiştên ko nivîskarekî dikare bibîne, li ber wî ne; keskesoreke yekta û rengên wê yê cihê û jîndar, yekîtiya esman û ava şîn, aso û hingûra ko

226

hêdî hêdî diqulipîn ser rengê sor, zincîra çiyayên li pişt bajêr, avahiyên bajarekî heftrengî. Hemû tiştên ko dikarin bên guhê nivîskarekî, li doraliyê wî ne; feşafeş û gujîna avê, vîevîa teyr û çivîkan, qeqqeb a kewan, şihîna hespan, kalîna berxan, dengên dûrên şêniyan û teptepa dil, deng û pejnên nexuyayî yê dil...

Celadet Beg deftera li ser masê, hinekî, ber bi xwe tîne, wê vedike û bi

pênûsa xwe ya reş û dirêj, di rûpela yekemîn de weha dinivîse;

Nav: Heyveron Gengre (çeşn): Roman Destpêk : Ronî, ronahî...

Mehr licht, yanî hinekî din ronahî...

5

Ronî, ronahî, hinekî din ronahî. Lê ji kû, çawan? Tarî ye, her der tarî ye, mîna binê bîrê tarî ye. Bi qasî misqalekî be jî, ronahî naxuyê. Xeberên ko tên, reş in; bûyerên ko diqewimin, reş in; gavên ko

tên avêtin, gavên bêgaviyê ne. Celadet Beg li mala nû, li oda xwe ya xe-

batê, cixare di dêv de, li ber masê rûniştiye û li der dinihêre.

Bi hêviyên mezin, Celadet Beg û Rûşen Xanimê mal guhestibû taxa Muhacîrînê. Wan li wir maleke li gora dilê xwe, bi kirêyeke erzan, peyda

kiribû. Ev mala nû jî, mîna mala Salihiyê, duqat, lê pirjûre bû. Tê de hewşeke fireh û di hewşê de jî, mîna mala din, bîreke avî hebû.

Ew bi

mehan li şamê geriyabûn da ko maleke weha bibînin. Malek ko dê fireh

û pirode bûya, tê de hewşek hebûya û di hewşê de jî bîr. Maleke weha

hewce bû, -ji ber ko Safter an jî Sînemxan ê bihata, ber b i êvaran, Celadet

Beg ê li hewşê, kêleka bîrê, rûništa û romana xwe Heyveron binivîsa. Heval û dost ê bihatina, bira û xweh ê bihatina û li mala wan mêvan bû- na Ehmedê Fermanê Kîkî û dengbêjên din ê, di şevên dirêj de, mal bi dengên tarîxî yên jiyana kurdî tijî bikirana. Gava herkes radiza, ew ê

rabûya û wî d ê rêzên şîr û romana xwe hişyar bikira. Di berbangên rojên nû de, wî dê şengê û Bêlen ê, tajiya nû ko kurdên aiyayê Kurmênc diyarî

wî kiribûn, bigirtana û biçya seyd û nêîran. Di bin perda rengê sor ê hingûrên şamê de, wî dê li qeqqeba kewên xwe yên ribat guhdarî bikira,

mêkew û mariyên xwe bifiranda û li wan binihêriya.

Lê eger bûyer ên ko wan nehesibandibûn, neqewimana.

Dirêj meke, Xortê halnas, dirêj meke. Bû yerên reş bêhejmar, mûsîbet pir bûn. Tu dê behsa kîjanê bikî û kîjanê nekî? Dev jê berde, ne tu serê xwe pê biêşîne, ne jî xwendevanên xemgîr bike. Heke te dil heye ko

227

tu gotinê bînî ser Heyveronê, hema bi carekê, ez bibêjim te ko min taqetnîn bû ew binivîsa. Ji ber ko bûyerên reş û mûsîbetên kambax pir bûn. Ne

hewce ye ko ez jî niha, yek bi yek, behsa wan bikim. Lê ez ê bi tenê û pir bi

kurtahî, behsa hin ji wan ko ez ji taqetê xistim, bikim.

Safter li nexweşxana fransizî ya şamê hate dinê. Kêfa me bêpayan bû.

Safterê biçk, bi rastî jî, bi Safter dima. Min ê Safter, mîna Safterê bira, mezin bikira. Jixwe min ê roman jî, bi bîranîna Safterê mezin, ji bo Safterê biçk binivîsa. Safter hat, lê yanzd eh roj bi dû hatina xwe re, ew dîsan ç. Berî ko Safter bê dinê, Rûşen ji apandisîtê emeliyat bûbû. Emeliyata wê zêde bi serketî nebû. û wê emeliyatê tesîr li Safterê biçk kiribû. Ew nexweş hate dinê, lê me hêvî hebû ko ew ê sax bûya. Deh roj û deh şevan, ez li ser serê wî bûm. Roja dawîn, ji bo karekî, ez derketibûm der. aaxa ez derketibûm, wî jî, bêzar û bêziman, xatir xwestibû û çûbû...

Mezo û Saadet Ablayê nameye ke kurt, li Stembolê, nivîsîbûn û bi alîkariya d ostekî, bi min gîhandibûn û tê de behs dikirin ko wan haziriya hatina şamê dikir. Ew ê bihatina şamê! Min ê xweh û dotmama xwe bidî- ta! Bi heyecanê, ez li hêviya wan bûm. Lê ew nehatin. Dewsa wan, nameyeke din ko ji ya berê kurtir bû hat; Saadet Abla bi qezayeke kambax miribû. Gava wê xwestibû ji bîrê av bikişîne, lingê wê şemitîbû û ew ketibû bîrê. Serê wê li kevirên bîrê ketibû û ew bêheş, di bîrê de, fetisîb û û mal- batê Saadet Ab la, yek ji neqşên rengîn ên jîna min, di goristana Uskûdarê de veşartibû...

Kekê min Sureya çûbû Parîsê. Ji Parîsê jî, ew ê bihata şamê û demeke

dirêj li nik me bima. Heta rojekê, ez ji postaxanê, bi telefonê, bi wî û Kamuran re jî peyivîm. Wî hal û hewalê me pirsîbû, Rûşen meraq kiribû û ji Rûşenê re, ji cil û bergên Lucien Lelong taximekî kinc kirîbû. Dengê wî hê di guhê min de ye; »Celadet, birayo, min pir bêriya te kiriye, gava ez hatim, em ê bi têra xwe b iştexilin...« Lê ew nehat, ew gotinên wî yên telefo nê, bûn go tinên dawîn ko min bihîstin. Wî, kekê min ê simbêlbadayî yê q eda û b elayê, mamostayê min ê xwendin û nivîsînê, hevalê min ê dilsoz ê Pera û Galatayê, ji sekteyî dil wefat kir. Kamuran û heval û dostên kurd û fran - sizan ew li wir defn kirin.

Di navbera van mirinan de, tişteki din, mirineke din, qewimî ko ez pê

gelekî eşiyam; qetîama Dêrsimê. Dêrsim, yan î deriyên sîm, deverekî xweş û çiyayî yê welatê kurdan bû, cîhê alewiyên kurdan bû. Her aliyê wêdar ûber, newal û gelî, zozan û çiya, çem û lehî bû. Kurdên Dêrsimê li hember rejîma Tirkiyê serî netewandibûn. Tirkiyê êrîşekî gelekî xedar biribû ser

228

Dêrsimê. Dêrsimiyan li ber xwe dabûn, bi qasî du salan. Lê dora wan girtî bû û eşîrên din ên kurd ko li der û dorên Dêrsimê dijiyan, neçûbûn alîkariya wan. Dêrsimî bi tenê mabûn, li ber çavên dinyayê û eşîrên din ên kurdan, rejîma Tirkiyê Dêrsim şewitandibû, Dêrsimî qir kiribûn. Li gora hin agahiyan deh hezar dêrsimî hatibûn kuştin, li gora hinên din çil hezar û hinên din jî sed hezar. Sêdar, dîsan, li dar ketibûn, serekên eşîrên Dêrsimê bi dar ve bûbûn. Qetlîameke mezin hatibû pê, lê kesî tiliya xwe neli- vandibû, ji kesî dengê derneketibû. Ne heq û hiqûq, ne jî wîjdan û ehleq, dinya û kurd ên din bi tenê temaşe kiribûn.

Ez çi b ibêjim? Ma mirov dikare b i kîjan gotinan mirinê û eşên wê vebê-

je?.. Mirinê, bi kêrekî ko, rehên min dibirîn. Mirinê dinya kiribû goristaneke mezin û em tê de, li vir, li wir, vedişartin. Mirinê tayên spî yên porê min zêde dikirin, rengê por, rîh û simbêlê min diqulipî ser rengê kefenê...

Vala ye, Celadet Beg destê xwe bi kû de davêje, bi tenê valahî tê destê wî. Ronahî naxuyê. Rast e, romana ko wî dê binivîsa, dê behsa şevê bikira. Lê ronahî dê di tariya şevê de hebûya, heyv ê hebûya. Heyveke ronî dê ron-

ahî bireşanda ser romanê. Lê ka, ronahiya jînê li ko ye, hema hinekî, bi qasî mistekê?

Celadet Beg deftera Heyveron-ê digire, berkêşka masa xebatê dikişîne,

6



defterê têdixê, devê berkêşkê digire û ji oda xebatê derdikeve. Celadet Beg herdu nameyên ko jê re hatine, ji resepsiyona otêlê werdigire û ji resepsiyonê derdikeve. Ew ber bi aliyê salona otêlê dere. Nameyek ji Parîsê hatiye, ya din ji Stembolê. Nama ko ji Parîsê hatiye, ji Kamuran e. Celadet Beg destnivîsa wî ya bedew dinase. Lê ya din ji kê ye?

Salona otêlê tenha ye, bi tenê çend kesên ewrûpayî, li aliyê din ê salonê,

li quncika herî dawî, rûniştine. Berî ko ew rûne, ew ji garson qahweyek

dixwaze û paşê, dere, li ber pencera mezin, li ser kursiyêke fireh a çermîn rûdine. Resepsiyona û salon, herdu jî, di qata duwemîn a otêlê de ne. Ji salona otêlê meydana Salihiyê û piştî meydanê jî kolana Salihiyê ko hertim

tijî şênî ye, dixuyin.

Celadet Beg westiyaye, bêxew e. Heta sibê, ew bê xew maye, bi alîkariya pakêta cixarê û şûşê, wî rêzine têvel nivisîne, rêzine şîreke fran-

sizî vergerandine kurdî, gotinine kurdî ko bi tîpa »F« dest pê dikan, nivisîne, rûpeline têkel ên hin kitêban tev dane, di nav fikir û gumanan

229

de çûye û hatiye û li ber destê sibê, gava Rûşen Xanim hişyar bûye, ew

ketiye nav nivînan. Rûşen Xanimê xebereke nû jê re gotiye; ew li hêviya

zarokekî nû ye.

Celadet Beg cixara xwe dikişîne û li der dînihêre. Evçend însan, evçend

şênî!.. Piştî kêliyêkê, ew li nameyên li ser masê vedigere û pêşî nama Kamuran vedike. Name ne dirêj e. Kamuran tê de behsa şerê nû ye Ewrûpayê dike, »Welê dixuyê ko dinya dê dîsan, bikeve ber pêla şerekî

dijwar û fireh...« Kamuran biryar daye ko vegere Rohilatê, Lubnanê.  
Ew niha şixulên xwe dide hev û wan serast dike, paşê ew ê vegere  
Bêrûdê. û

paşê jî silav, dîsan silav...

Zerfa nama din ko ji Stembolê hatiye, boz e. Xetên li serê jî,  
bervajiyê

ya Kamuran, bi erebî ne. Lê Celadet Beg xetan nas nake. Ew bi  
hêdîka

namê vedike; »Mon cher Ceco...« Name bi fransîzî hatiye nivîsîn.  
Ceco...

Kê ew nivîsiye? Celadet Beg li binê namê dinihêre. Canan! Cananê  
ew nivîsiye. Celadet, bi lez, nama ko ne ewçend dirêj e, dixwîne;  
halê

Cananê baş e, na, ne baş e, lê ne xirab e jî. Dinya guheriye, kesên  
nas kê

bûne, ew kesî nabîne, ber bi danên êvaran, carina, ew bi wapûrê,  
dere Galatayê, berî ko ew vê namê binivîse, bi çendekê, ew çye  
restorana

Belvu, restorana ko ew diçûnê û wan lê dans dikirin. Restoran vala  
bû ye, dinya pir biha bûye. Rojname bi hewadîsên şer tijî ne. Tirkiye  
jî haziriya şer dike. Pera û Galata jî guherîne, koça »eqeliyetan«  
dewam dike, cihû, îtalî, ermen û rûmên taxê, dev jê berdidin û  
derin Awrûpayê. Navê Cade-

yî Kebîr, yanî Rue de Pera, guheriye û bûye îstîklâl Caddesî.

Cananê bêrî li Celadet, hevalê xwe yê ebedî, kiriye. Lê pasaporta wê  
nîn

e ko ew bikaribe were ziyareta wî. Ew ê hewl bide da ko bikaribe  
pas-

aporteke nû derxe. Eger ew bi ser ket, ew ê bê Lubnanê, ziyareta  
Celadet,

şagirtê Ovidius... û paşê silav û hembêz û ramûsan...

Piştî ko keştiya Pierre Lotî Canan ji Bêrûdê wergirtibû û biribû  
Stembolê, yekemîn car bû ko min jê tişteki dibihîst. Sal derbas bûbû

n. Dewran diguherîn. Hêlîna teyrê kor, Xwedê çdikir. Em, her yek, li derekî, li gora ed et û ûsilên dewranan, dijiyan. Rê ji hev ved iqetiyân û te didît, dîsan, ji nişka ve, ew digihîştin hev. Niha jî Kamuran ê bihata. Canan ê, belkî, bihata. (Deftera ko wê dabû min li kû bû? Min ew li kû winda kiribû?)

Zarokeke nû dê, belkî, bihata... Wê rojê, gava ez ketibûm nav cîhan û

Rûşen li rê bû ko biçya dibistanê, ser karê xwe wê li ber devê derî gotibû, »Celadet Alî...« min jî lê vegerandibû û gotibû, »Soyle kizim...« û hingê wê

230

gotibû û bi lez derketibû û çûbû, bêyî ko li hêviya min bisek ine. Zarokekî nû li rê bû... Heye ko kurekî pozberan yan jî keçeke çavreş ê bihata... Kê dizanîbû?..

Piştî ko Celadet Beg qahwa xwe vedixwe, ew cixareyeke din vêdixwe.

Nûeyên ko ji cîhên cihê tî, eynî ne; şerekî nû yê xedar li ber derî ye.

Welê dixuyê ko dinya dê dîsan tev li hev be. Kurd? Ya kurd ê çi bibin? Kî

dizane?

Berî ko Celadet Beg rabe, ew nama Cananê diçrîne û dixwe xwelîdanka

li ser masê, nama Kamuran jî dixwe berîka xwe ya çakêt û ew radibe.

231

232

FOTOGRAF 14: Hawar û sê zarokên din; Sînem,

Cemşîd û Ronahî... û hinekî din ronahî!..

1

Wêneya 14-an a wêneyeke ronî ye. Celadet Beg û Rûşen Xanim, li ser kursiyan, li kêleka hev, rûniştine. Herdu jî li kamerayê dinihêrin. Rûşen Xanim bi ken e, rûyê wê dikene.

Celadet Beg jî bi ken e, lê bi tenê çavên wî dikenin. Di vê fotografê de ken heye.

Du zarok, keçek û kurek, li ser herdu çogên Celadet Beg rûniştine. Navê keçikê Sînem, navê lêwik Cemşîd e. Li piştta fotografê, bi dest- nivîseke erebî, weha hatiye nivîsîn; Celadet, Rûşen, Sînemê, Cemo. Sînemê û Cemo, yanî Sînem û Cemşîd zarokên wan in. Cara yekemîn,

di vê fotografê de, Celadet Beg, mîna bav û xwedî zarok, dixuyê. Ew bûye bav, bavê keçekê û lawekî. Celadet Beg, çakêtekî sport lê, porşehkirî, her- du destên xwe di piştta zarokên xwe re birine, ew hamb êz kirine û hinekî

maxrûr, li çavika kamerayê dinihêre. Zarok jî dikenin. Keçik, devê wê

vekirî, çavên wê hinekî girtî, dikene. Lawik, devgirtî, mîna bav, p or ber bi

ş ehkirî, li kamerayê dinihêre û dikene.

paş

Keçik hinekî li diya xwe lawik jî li bavê xwe çye. Lawik eynî Celadet Beg e. Mîna ko Celadet Beg bûye zarok û dîsan bûye Ceco, Cecoyê dapîra xwe Rûşenê. Cemşîdê Rûşenê û Cecoyê Rûşenê... Keçik 3-4 salî, lawik 1-2 salî dixuyin. Herdu jî bêpayan xweş, bêpayan geş in; mîna hey- va çardehê şevê ronî ne. Keçik hinekî gulover, lawik zirav û dirêj e. Lêwik serê xwe daniye ser milê bavê xwe, keçikê herd u destên xwe vekirine, mî- na ko ew li çepikan dixê.

Ev fotografa ko pir xweş hatiye kişandin, rengêkî nû li rengên jiyana Celadet Beg û rûpelên nû ko bi rengê nû tînen rengandin, li romana Bîra

Qederê zêde dike. Eger meriv fotografê mîna rûpelên wextê û jiyane bi- hesibîne, ew fotograf rûpeleke nû û ronîya wexteke dirêj a umrekî balkêş e. Ev fotografa ronî, di eynî wextê de, îspata ronahî

û kenê ye jî. Ev nîşan dide ko di hin cîh, wext û heyamên wî umrê balkêş de, ken jî hebûye. Di

233

hin rûpelên romana Bîr a Qederê de ken jî heye.

Ev fotograf û kesên fotografê îspat dike ko Celadet Begê ko ewçend ji

jiyana mal, malbat û zarokan direviya, bûye xwedî mal, malbat û zarok;

Sînemê û Cemo di hembêza wî de dikenin. Ev fotograf, îspata bergeheke, bi qewlê Rûşen Xanimê, famîlyer e. Famîlye, mal, malbat û zarok, bêgu-

man, wêne û fotograf divê. Kamera divê, îspata wext û dewranên ko zarok tê re derbas dibin, divê. Her du yan jî sê mehan carekê, Rûşen Xanim li zarokan dinihêre û dibêje; wext hatiye. Zarok mezin dibin,

diguherin. Guherîn divê îspat be. Zarok ê, sibê roj, li fotografan, li şopên

xwe yên jiyane, binihêrin û rojên bihurî bi bîr bînin û li zaroktiya xwe binihêrin. Wext hatiye... Ma mal û zarok bê fotograf, kamera û îspatan dibe? Nemaze gava mal, maleke Bedirxanî be û li ber xetera windabûnê

be...

Lê Rûşen Xanim tu kamera navên, -ji ber ko fotografkêşê herî baş ê şamê dostê malbatê ye. Malik Tahir û birayên wî ko li hemû navç mî- na fotografkêşên hoste tên zanîn, carina, her du-sê mehan carekê, tên

taxa Muhacîrîn, mala Celadet Beg û Rûşen Xanimê û fotografên zarokan dikişînin. Mîna vê fotografa 14-an a Bîra Qederê, carina tevî fotografên

zarokan, yên Celadet Beg û Rûşen Xanimê jî. Herçend Mr. Xandemian li Stembol, Kadikoyê, dost û hevalê malbatê bû, Malik Tahir û birayên wî jî ewçend, li şamê dost in. Eynî mîna Mr. Xandemian, Malik Tahir

jî carina, bi xwe, tê û dixwaze fotografên malê bikişîne. Malik Tahir û bi-

rayên wî ji kurdên şamê, Eyubiyên in. Studyoya wan a fotograf û gravu-

ran li cîhekî xweş û şên, li ser kolana Salihiyê ye. Tevî ko fotograf, sûret û kişandina wan, li gora dîne îslamê, ne di cîh de ye û ew li şamê navenda

çanda îslamê, dijîn, studyoya wan hertim tijî ye. Her celeb meriv, ereb, fransîz, cihû, ermen, suryan û kurdên tînan û fotografên xwe dikişînin.

Fotograf ji gelek tiştên di girîngtir e, ji ber ko ew îspata dewr û dewranê,

umir û jiyane ye.

Lê herç kişandina fotografên Sinemê û Cemo ye, Malik Tahir bi xwe dere mala wan û fotografan dikişîne. Çawan ew ê mîrên kurdan bînin studyoyan?.. Mîr, mîr in. Do jî, îro jî, sibê jî...

Li piştê vê fotografa 14-an, li bin navan, bi xet û neqşên gelekî xweş û

bi fransîzî, »Photogravure - Eyo ubiye Frères« nivisiye. Di vê fotografa bi- rayên Eyûbiyan de, Celadet Beg gelekî li bavê xwe Emîn Alî Beg dişibe. Ew jî mîna bavê xwe rûniştiye; piştê wî rast, sîng û rûyê wî li pêş, serê wî

hinekî hildayî. Kenê çavên wî jî, mîna ya Emîn Alî Beg, kîbar û bi pîvan

234

1. Gelo tarîx dubare dibe, bi guherîna wext û dewranê, tarîx vedijê? Di vê fotografa ko Malik Tahir kişandiye de, mîna ko Celadet Beg ketiye

dewsa bavê xwe Emîn Alî Beg û Cemşîd jî ketiye dewsa bavê xwe Celadet

Beg. Di fotografên Mr. Xandemian de, Celadet Beg zarok bû û li ser ajnûya bavê xwe rûdinişt, lê di fotografên Malik Tahir de, ew bav e û lawê

wî li ser ajnû rûdine.

Stembol, Kadikoy. şam, Muhacirîn... Du qonaxên qederekê ko bi rengên cihê hatine hûnandin. Stembol, Kadikoy; konaxa yekemîn.

şam,

Muhacirîn; konaxa çendan? Ya dawîn?

2

– Qonaxa çendan? Ya dawîn? Na, Celadet Beg dibêje, ne qonaxa dawîn, lê qonaxa diduyan... Jixwe di vê hejmara destpêkê de, min bendek bi navê »Sê tarîxên Hawar-ê« nivîsiye û tê de qala vê yekê

dikim. Qonaxa yekemîn Hawar bû, weşandina wê û alfaba latînî bû. Me

qayideyên nivîsîna kurdî, ji nû ve, anîn pê, xwendin û nivîsîna kurdî, hêsan kir, ziman sivik kir, gencineyên zimanê kurdî weşandin. Niha jî, di

vê qonaxa diduyan de em ê van şixulên xwe yê bingehîn firehtir û kûr- tir bikin. Jixwe min di benda xwe de jî nivîsiye; hîmê zimanekî li ser sê

hêmanê bingehîn sekiniye: Alfabe, gramer û ferheng. Alfabe tamam, ni-

ha dora gramer û ferhengê ye. Heç xwendevan e, qonaxa nû, jê re weha

dibêje; hîn bin, hîn bin, hîn bin, hîn kin, hîn kin hîn kin...

– Prins Bedir-Khan, min artîkila we, bi leza kêliyê, xwend, Roger Lescot, yek ji dîplomatên navdartirîn ê fransizan, bi kurdî, dibêje.

We

Hawar baş presente kiriye. Beşê fransizî jî ne xirab e. Ez we pîroz dikim û

umrekî dirêj, ji Hawara nû re, dixwazim...

Dîsan bihar e, bihara 1941-an. Gulên sor ên hewşa Celadet Beg û Rûşen Xanimê, bi rengê xwînî, bişkovîne. Hehecîk, dîsan, hatine. Bajarî, kurdên şam û Helebê haziriya zozanan dikin. Dîsan hew şa Celadet Beg e. Lê ya mala nû ya Taxa Muhacirînê. Dîsan

heval û dostên wî civiyane, - li kêleka bîrê. Lê bîra mala nû. Hawar dîsan, ji nû ve, der- ketiye. Hejmara yekê, na, ne hejmara yekê, hejmara 27-an, îro, 15-ê

nîsana 1941-an, nû ji çapê derketiye. Du şagirtên çapxana Sebatê, bi lez, çend tomar kovar, anîne malê. Ew li kovara ko hê jê bîhna çap û çap xanê difûre, dinihêrin. Kesên ko hatine, dîsan, yên berê ne. Rûşen Xanim, Elî

Axayê Zilfo, Mihemed Axayê Zirkî, Emer Axayê şemdîn, Silêman Efendiyê Qotreşî, Arif Ebas Beg, Husnî Berazî Beg, Muhsîn Berazî Beg,

Memduh Selîm Beg, Nîzametîn Kubar Beg, Osman Sebrî, Dr. Nazîf 235

Beg, Ehmedê Fermanê Kîkî. Lê vî danê êvarê, li hewşê, navên nû jî hene;

Kamuran Beg, Roger Lescot, Qedrî Can, Cegerxwîn, birayê biçk ê Dr. Nazîf, Nûredîn, Qedrî, Ekrem, Mîqdad û Bedrî Begên Cemîlpa şa. Ji vê

civata ko pirî caran ji hev dûr in, lê îro, bi hênceta pîrozbahiya ko varê ha-

tine mala Celadet Beg, merivek kêr e; Haco Axa... Haco Axa wefat kiriye, lê dewsa wî, lawê wî Hesên Axayê Haco hatiye.

Celadet Beg? Hal û hîsên wî yên îro?

Tevî ko ba û bahozen şer hawird or vegirtibû, bihar, demsala geşiyê, dîsan, hatibû. Rojê nû ya pîroz a biharê, hêdî hêdî, ber bi êvarê, diç. Wê rojê, gelekî zû, ez bi dengê tajiya xwe ya belek ko min navê wê Belên, yanî soz, yanî ehîd, lêkiribû, hişyar bûm. Dinya hê baş ronî nebûbû. Jixwe, hema çi bigire, xew neketibû çavên min; Hawar, zaroka min, ezîza ber dilê min, ê, ji nû ve, biweşiya! Bêyî ko ez Rûşenê hişyar bikim, bi hêdîka, ez ji textê razanê, peya bû m, ji odê derketim û çm oda zariyan. Sînem û Cemo, mî- na du melaykan, diniviyên. Cemo tiliyên destê xwe xistibûn devê xwe û ew dimêtin. Xweha wan a nû dê, wê rojê, bihata. Ez derketim hewşê. Bayêdinya çiksayî, hinekî, ez, hejandim. Ez çm nik lîsên



kewên xwe û bi qasî çendekê min li wan, bedewiya wan û rengên wan ên birdikî, reş, belek, spî û sor nihêrî. Min teyfik dîsan, tijî qût kir û danîn ber wan. Paşê jî ez çûm nik Belênê. Belên hişyar bû, zimanê xwe derxistibû û dinihwirî. Ez çm ser bîrê, min sitîlek av kişand, tasika ava Belênê tijî kir û ew da ber wê. Pa şê jî, heta zarok û diya wan hişyar bû, ez bi gul, kulîlk û çîekên hewşê daketim. Kulîlk dibişkovîn, mêşên hingivîn, bi ûsil û vizeviz, vediniştin ser gul û kulîlkan. Hingê, çaxa çend ref quling, li pey hev, di esmanê vekirî yê şîn de, firiyar û derbas bûn, min serê xwe rakir û bi kêf, li wan nihêrî. Şer bû, ba û bahozên şer dinya dabû ber xwe. Lê wê rojê, digel her tiştî, dinya xweş bû, tu tişt û kesê ko ez hêrs yan jî eciz bikirama, nîn bû, kesê ko derd û kederên min bi bîra min bianiyana, tune bû. Derd û kederên ko bîhn li mindîçikandin, hesreta ko ez carina dikirim mejnûn, xirabiyên ko bi min bûbûn, kurt û bistên ko li dijî min dihatin gotin, wê rojê, ji min, gelekî, bi dûr bûn. Mala germ, xaniyê bi dengê zarokan şên, bîr, yanî kahniya avê, dengê textên bîrê, dilopên hûnik ên ava bîrê ko li ser kevirên bîrê, mîna çirûskan, dixuyan û winda dibûn, hêşinahî, rengên biharê, esmanê spehî, hemû, her tiştê xweş wê rojê li dora min bû.

û Hawar wê li wan zêde bûya. Xewna min, xwesteka min a herî mezin, dîsan, bi cîh dihat. Diviya got-

236

inên kurdî nemirana, diviya ew bihatina vejandin... Berî ko tu yan jî xwen - devanên bipirsîn, çima »diviya«, ez, bi carekê, bibêjim; PierreLoti, ew keştiya mezin û spî, ko her roja pêncşemiyê, ji Stembolê derdiket,

Zerya Marmara û Zerya Spî û pêlên wan dida ber xwe û dihat Bêrûdê, her

carê, bi xwe re, hin rojname û kovarên tirkî jî dianîn. Pê şî ew weşanên ko hinekî kevn bûne, li Bêrûd û Lubnanê digeriyan, pa şê jî ew, hinekî din kevntir, dihatin şamê. Gava ew dihatin, min her tişt ji destê xwe berdida û tî û birç, bi hesreta salan, xwe davêt ser wan û ew dixwendin. Heta rêza

dawîn, heta xeberên sporê, heta xaçerêzên wan. Lê her carê jî, ez dilşikestî,

xemgir û bîhteng ji ser wan radibûm. Ji ber ko ew tijî xeberên reş bûn û berdevkên siyaseteke vajî û neînsanî bûn. Rojnameyên Cumhuriyet û Vatan-ê dihatin, Kovarên Ikü, Kadro, Bozkurt, Türkçü Dergî, Yurt ve Dünya dihatin. Ji Yurt ve Dünya pê ve, ew rojname û kovar, hemû, kursî û organên siyaseta »tirkîzasyonê« bûn. Li gora wan, li Tirkiyê, bi tenê tirk hebûn, zimanê tirkî hebû, heyin û çanda tirkî hebû... Gel û milletên din?

Ziman û çandên din? Ji bo wan, bi tenê, riyek hebû; tirk bûyin... Heçî heyin

û zimanê kurdî bû, qedexe bûn. Nav diguherîn; navên hezar salan ên meriv û malbatan, bajar û gundan, deşt û zozanan diguherîn û dibûn tirkî. Navên dar û ber, gul û kulîlkan diguherîn. Binevş dibû menekşe, beybûn dibû papatya, stêrgul dibû yý

ldý

zçiçegi... şan û şoret, nav û nîşanên

mirovan diguherîn, paşnavêkî tirkî, mîna pîne, bi huwiyeta kurdî vedizeliqî û dikete pey kurdan. Navê mal û malbatên kurdî dibûn Öztürk,

Cantürk, Korutürk, Soytürk... Em, Bedirxaniyên sedan salan jî bûbûn çinar.

Bedirxaniyên ko bi sedan sal mîrên Cizîra Botan bûn, tesîr li navçê û dewleta Osmanî kiribûn, bi carekê, bûbûn ainar, yanî hî, vala, pûç. Kê dizanîbû ka ainar kî bûn!

Zimanê kurdan hatibû jêkirin. Kilîd li zimanê wan ketibû... û ew rojname

û ko varên berdevk, her û her, bi xeberên vê yeka kambax, tijî bûn. Ew xeber dibûn tîr û bi dil û canê min diketin. Ez dibעיcîm, diteqiyam. Carina ez ji xewê vediciniqîm û diqîriyam; na, nabe, divê zimanê kurdî nemire!.. Belê, welê bû, ez welê difikirîm; gotina Amojna Stî û Bavo ko ez pê rabûbûm, mezin bûbû m, diviya nemira. Zimanê min, gotinên min ên şevên tarî ko bédeng li ser kaxizan

direşyan, diviya kilîd bişkanda. Gotinên şevên şamê diviya birînên zimanê kurdî yên xedar bicebirandi- na...

Wê rojê, danê êvarê, merhem dihat, HAWAR derdiket!

237

– Sed heyf ko Haco Axa ev roj nedît, Memduh Selîm Beg, kovar di destan de, ji Hesên Axayê Haco re, dibêje. Ew ê gelekî kêfxweş bûya. Ne

wisan e, mîrê min?

– Bêguman, Celadet Beg, destê xwe dibe rîha xwe ya spî û dibêje. Lê ez

welê texmîn dikim ko ew û miriyên me yên din, îro, di gorên xwe de, re-

het, dinivin. Me mucele derxist, niha jî me şixulekî heye; domandina wê...

Celadet Beg, Roger Lescot, Kamuran Beg, Memduh Selîm Beg, Qedrî

Beg, Elî Axayê Zilfo û Hesên Axayê Haco, li kêleka bîrê, li ser lingan, sek - inîne û dipeyivin. Kovar di destê hinekan de ye. Piştî bîskekê, ew ê bi hev re, ji bo şîva êvarê, herin aşxaneyê kevnar ko li kêleka Meydana Merce

1. Bi hênceta derketina kovarê, Hesên Axayê Haco ew ezimandine. Hesên Axa ko pir bi bavê xwe dişibe, çavê wî li ser kovarê, bêyî ko li Celadet Beg binihêre, jê dipirse,

– Mîrê min, ji bo domandinê çi divê?

– Gelek tişt divên, lê berî her tiştî pere û kiryar... – Kiryariya salekê bi çi ye?

– Bi pênc lîrayên Sûrî ye...

– Mîrê min, heke tu eciz nebî, min dil heye, ez hinekî alîkariya cerîdê bikim... Berî ko ez bêm vê derê, min bazareke nexirab li dar xist û jê perene baş qezenc kirin. Para cerîdê jî tê de heye. Ez dixwazim 400 lîra

bidim cerîdê...

– Mala te ava, Celadet Beg dibêje... heye ko ev alîkariya te rê veke... – Belê, Memduh Beg dibêje, ew ê rê veke, lê me 400 lîra nîn in, em çi

bikin?.. Ez ê deh lîra alîkarî bikim... herkes bi qasî quweta xwe.

– Ji min jî pêncî lîra, Elî Axayê Zilfo dibêje.

– Ji aliyê min û Nûredîn jî, Dr. Ehmed Nafîz Beg dibêje û ber bi aliyê wan tê.

- Ez jî, li ser navê hemû Cemîlpaşayan şêst lîra didim, Ekrem Beg dibê -

je.

Yên din jî ber bi wan, kêleka bîrê, tên û her yek, li gora quweta xwe, 3

tiştêkî dibêje.

Ehmedê Fermanê Kîkî, kalê malê, bi destê Sînem û Cemşîd digire û ber bi Celadet Beg û Rûşen Xanim, diya wê û Huseymayê ko li hewşê, li kêleka bîrê sekinine, tê. Dinya hê nû hişyar dibe. Destê sibê ye. Roja germ a havîna 1941-an hê nû dest pê kiriye. Celadet Beg û

238

Rûşen Xanim bi dangan hişyar bûne û derketine hewşê. Diya Rûşen Xanimê û Huseyma jî dane pey wan.

Ji dûr ve deng tên, dengên tanq û topan...

şerê nû yê cîhanê ko li ser kaviên şerê yekemîn ê cîhanê, li Awrûpayê,

bilind bûye, îro, xwe gîhand iye deverên Sûriye û Lubnanê. Bayên şer ko ji Ewrûpa tên, îro, mîna pêlên derya, li qiraxên Lubnan û Sûriyê dikevin. Xeberên ko wan dibihîstin, bi van dengên topan, îro, rast derdikevin. şer

li ber deriyê wan e.

– Bavo, ev çi ye? Ev dengê çi ye? Sînem dipirse û ber bi Celadet Beg tê.

– Metirse delala min, Celadet Beg dibêje û xwarî keça xwe dibe û wê

hembêz dike. Ev dengê tanq û topan e, lê metirse.

– Bavo, ev deng pîs e, pir pîs e, Cemşîd dibêje.

– Herê, pîs e, kurê min...

Deng dihatin, dengê şer û mirinê, agir û şewatê gihîştibûn me jî. Agir bi dinê ketibû, tu çare nîn bû, gulokên êgir, hêdî hêdî, ber bi me jî dihatin. Agir bi Rohilatê jî ketib û.

Ev şer bi tu şerên din nedima. Bi gotina alîm û feylesofan, ev şerê nû diya

hemû şerên cîhanê bû. Aleman, bi serekiya Hitler û nazîstan, ketibûn pey tolhildanê. Di şerê yekemîn de ko hingî ez jî li aliyê Qefqesan, di nav refênşer de bûm, alemanan şikestên dijwar xwaribû n, zora wan çbû û ew ji hev ketibûn. Lê aleman, nijadê cermen, dîsan, di wexteke kurt de, xwe dabû hev. Hîtler û tevgera wî ya Nasyo nal Sosyalistan, yanî nazîstan, komin jî li Munîxê, di destpêka salên bîstan de, şahîdiya tevgera wan kiribû, dewlet bi dest xistibûn û ketibûn pey heyf û tolhildanê; ew bi Nemsê re bûbûn yek, dewleta aekoslawakyayê ji o rtê hildab ûn, dirêjî Polonyayê kiribûn û Polonya û Danzîg tevî nifûseke têr bi sîh û du milyon rûniştem- anan, vegirtibûn, bi îtalî û japonan re peymaneke biratiyê anîbûn pê, bi ûrisan re li hev hatibûn, êrîş biribûn ser Danmark û Norvejê û ew der jî bi dest xistibûn, paşê berê xwe dabûn Holanda û Fransê, çaxa tanqên wan ketibûn Parîsê, hingî wan, bi balafiran, dirêjî Ingilterê kiribûn. Ji ber ko Ingiltere giraveke mezin bû, çarnikarên wê av bû û nedigiha beja Awrûpayê, alemanan bi noqar û balafiran li îngiltere, nemaze Londrayê, xistibûn. Paşê hevalbendê Alemanyayê îtalya jî ketibû şer. Wan jî dirêjî Afrîka Bakur kiribûn, Misir, Somalistan, Trablusgarb vegirtibûn. Ji wir jî, îtalî dîsan vegeriyabûn Awrûpayê û ketibûn erdên Yewnanistan û Ernewidê û ew der zemt kiribûn. Alemanan jî Mearistan, Romanya, Yugoslavya û

239

Bilgaristan vegirtibûn...

Lê li her derî îngilîzan û hevalbendên wan li ber xwe didan û li hember

êrîşên aleman û îtaliyan disekinîn, -heta di gelek cîhan de jî bi ser diketin. Şer bi vî terhî dewam dikir.

Tu bibêje, heta havîna 1941-an jî, me şer ji rojname, kovar û radyoyan

dibihîst. Gulokên agirê şerên nû negihabûn peravên Lubnan û Sûriyê. Lê destpêka havînê, tiştê ko me hemûyan dipa, qewimî; li Iraq ê hikumet guherî, mîrê Iraq ê Evdililah reviya Filistînê û Reşîd Elî Begê Kêlanî hukim xiste destê xwe. Reşîd Elî Beg bi ser alemanan bû, şer di navbera wî û in- gilîzan de derket. Ale man hatin hawara Reşîd Elî Begî, bi balafiran ko di ser esmanên Lubnan û Sûriyê re difirîn, li îngilîzan xistin. Lê dawiya dawîn in - gilîz ketin Baxdayê, Mîr Evdililah û hevalên wî anîn û hikum xistin destê xwe. Gulokên agirê şer êdî ketibû Rohilatê. Niha jî dor hatibû Lubnan û Sûriyê. Fransiz, karbidestên Lubnan û Sûriyê, bûbûn du bir; birê hikumeta resmî ya Fransê ko bi ser Hîtler bû û birê General De Gaule ko azadîxwaz û hevalbendê îngilîzan bû. Dihate gotin ko alemanan bi alîkariya heval - bendên xwe yê fransiz, esker derxistine Lazkiyê û balafirên xwe li şam, Heleb û Riyaqê bi cîh kirine. Loma jî îngilîzan, bi alîkariya hevalbendên xwe yê fransiz, yanî golîst, avêtin ser balafirgehên şam, Heleb û Riyaqê û ew der bombeyan kirin. General Denz, serekamîrê Lubnan û Sûriyê, di radyoyê de da zanîn ko ew ê li dijî îngilîzan, dest bibin xwe. Lê îngilîz û fransizên hevalbend êrîş birin ser hêzên fransiz ên hikumeta Vişiyê û ew ji aliyê bakur ketin erdê Sûriyê û dirêjî Tidmir û Dêra-Zorê kirin.

Şerê ko min baş dinasî, hatibû, dengê tanq û topan digihîştin şamê. Bajarê medeniyeta îslamê, bajarê şev û xewnan, êdî ne bi dengê ezanê, lê bi dengên tanq, top û balafiran hişyar dibû... Heçî mala me bû, şên bûbû, pêşî Sînem, paşê jî Cemşîd hatibû. Piştî ko em têgihîştibûn ko navên ko li ber dilê me pir ezîz bûn, Bedirxan û Safter, li me nedihatî û me ew li xwe qedexeyê kiribûn û biryar dabû

ko heke zarokekî nû were dinê, em ê navekî din lê kin, hingê ez bûbûm bavê keçeke çavreş û lawekî enîfireh. Bi hatina zariyan, her tiştê malê û jîna min, ji b inî ve, guherîbû ; em, ez û Rûşenê, nema bi tirkî dipeyvîn, zimanê malê bûbû kurdî. Nema alkol dikete malê, ca- rina ez diçm nik heval û dostan û min li ba wan, hinekî, vedixwar. Hejmara cixarên rojekê ji d u pakêtan ketibû deh - donzdan. êdî ez bêtir li malê bûm. Ji malê dengê girî û kena zarokan, dengê bilûr û awaza Ehmedê Ferman û qeqeba kewan bilind dibû. Ji malê bîhna zarokandifûrî. Li malê d ermanê derd û keserên min heb û...

240

Lê şer hatibû, bi çirûsk û pizotên xwe agir bi dinê xistibû.

Celadet Beg, guhê wî li ser dangan, serê xwe ber bi jor dike û li esmên

dinihêre. Ji rengê şîn û çend ewrên boz pê ve, tu tişt naxuyin. Lê deng tîn. Ew piştî xwe dide kevirên dîwarê bîrê û li ser totikan rûdine û her-

du zarokên xwe dixwe hembêza xwe.

– Bavo, ev çi ye, dengê çi ye? Cemşîd destê xwe dibe rîha Celadet Beg

û dipirse.

Celadet Beg bersiv nadiyê. Ew, bi dîqet, guhê xwe dide ser dangan. Deng, hêdî hêdî, nêzîktir dibin. Gelo ev dengên nû ko nêzîk dibin, yên

çi ne?

– Rûşen, kizim, çêtir e ko tu zariyan bibî hundir, ew dibêje û dîsan radibe ser piyan.

Deng nêzîktir dibe. Niha ew deng dinase; dengê balafiran... Rûşen Xanim radihêje destên zarokan û wan ber bi aliyê hundir dibe. Diya wê jî bi destê Huseymayê digire û dide pey wan. Lê berî ko ew bikevin hundir, di ser hewşê re, refekî balafir, bi leza birûskê, difirin û derin.

4

– Ew çi bû, ew çi ye, Cemşîd bi qîrîn dibêje.

Bavo, ev çi ye, Cemşîd, li oda xebatê ya Celadet Beg, li ser çogên Celadet Beg rûniştî, bi ken dibêje.

– Ev Ronahî ye, kurê min... – Ronahiya kê ye? – Ronahiya me kurdan e. – Ka çima ew ronî nake? – Ronahî di nav rûpel û rêzên wê de ye. – Mîna Hawar-ê? – Herê, mîna Hawarê. – Bavo, ew xweha Hawarê ye? – Herê, ew xweha Hawar -ê ye û xweha te û Sînemê ye. Navê wê

Ronahî ye.

– Bavo, de bixwîne

- Na Bavo, mexwîne, Sînema ko li kêleka kursiyê Celadet Beg, li ber lingên bavê xwe rûniştiye û li wan guhdarî dike, dibêje. Mexwîne, lê

behsa resiman bike. Resimên Ronahî-yê pir xweşik in. Ev jî nikê ye? Bêje min Bavo, ev kê ye?

241

– Were berxa min, tu jî were, Celadet Beg dibêje û dixwaze Sînem jî li

ser çoga wî rûne.

Lê nabe, zarok êdî mezin bûne, herdu bi hev re, nikarin li ser çogan rûnin. Celadet Beg Cemşîd datîne erdê û bi xwe jî ji kursiyê peya dibe û

li kêleka kursiyê rûdine. Ew li zarokan dinihêre û paşê vedigere ser kovara

nû ko bi navê Ronahî derketiye.

– Ev peyayê dirêj ko kincên eskerî lê ne, general De Gol e, ew serkanê

Fransa aza û fermandarê ordiya aza ya Fransê ye. Ev xanima kinik ko li

kêlekê ye û serê xwe rakiriye û li General dinihêre, xudantaca Ingilîstanê,

Qralîçe Elîsabet e. Heçî ev sûreta çar kesên rûken e, ew balafirvanên



Ingilîstanê ne, kincên wan yê balafirvanan e. Ev sûreta kêlekê jî vapor û filûqeyên ingilîzî nîşan dide. Ew nêzîngî li noqareke birîndar a îtalyanî dikin da ko wê hêsîr bigirin.

– Bavo, pir xweş e, Bavo, dom bike, Cemşîd dibêje...

Resim û sûretên hejmara yekemîn a Ronahî-yê, yê şer, yê agirê tofanê bûn. Lê kêfa Cemo ji wan re dihat! Ji bo wî, ew bi tenê resim bûn, ne tiştêkî din. Ji resiman ne dengê topan dihat ne jî bîhna xwîn û barûdê. Lê şer, bi hemû xurtiya xwe, dewam dikir. Hilweşîn û şewat ko bi ser ketibûn û zoraheş û mantikê biribûn, li govendê bûn. Herwekî şerê yekemîn ê cîhanê, dinya, dîsan, mîna hêlekanekê, di nav agirên şer de, diç û dihat. Bîhna mirin, agir û şewatê ji cîhanê dihat.

Heçî Lubnan û Sûriye bû, ketibû destê ingilîz û fransizên golîst. Li Lubnan û Sûriyê, li der û dorên şamê, şûrê ruhistîn, bêrawest, li dar bû. Li Derhe, Xebaxib, aiyayê Qesyûn, Mezê, Hims, Dêra-Zor, Reqe, Qamîşlok û şamê pêveçûnên dijwar hatin pê. şam bombebaran bû. aend bombe li taxa me, Muhacirînê jî, hema çend sed mîtro ji me bi dûr, teqiyên. Hin bombe jî li dora Mizgefta Emewî û tirba Selehedînê Eyûbî teqiyên. Ji bîs- tan zêdetir xanî hilweşiyên, nêzîkî sed kesî hate kuştin. Rojek ji wan rojan, danê êvarekê, Huseyma, di d estan de çend berikên tifing û mîtralyozan, hate oda min a xebatê û gote, »Bavo, li van binihêre...« Wê ew li ser banê cîranan dîtibûn. Min jî ew berikên vala, xatireyên şer, danîn nik berikên ti- jî yê demança xwe. şamî rojên bi tirs û lertz derbas kirin. Lê dawiyê hêzên Mareşal Vişy ji mintiqê kişiyên û General De Gol û serekwezîrê Ingilîstanê Mr. aorçîl îstîklala Lubnan û Sûriyê îlan kirin.

Em kurd li kû bûn û me çi dikir? Bê guman e ko cîhê me li nik cîhana aza

û d emokrasiyê bû. Hem min hem jî kurdên din, bi xurtî, alîkariya hêzên

demokrat kirin. Tevî zabitên fransizên aza û ingilîzan, ez, çendîn caran, çûm aliyê Cizîrê, welatê kurdan û li wir me ji kurdan hêzên çekdar anîn pê

da ko bi alîkariya hêzên aza rabin. Ma şerê me kurdan ne ji bo demokrasiyê bû? Ma daxwaz û doza me ne ji bo wê bû? Ma derd û belayên me yên sed-

salan hemî ne ji kê manî û tunebûna demokrasiyê bûn?.. Piştî ko dinya

hinekî li Sûriye û Lubnanê aram bû, min dest bi kovareke nû kir. Bi alîkariya

fransiz û ingilîezan. Ez ê paşê bêm ser alîkariya wan û sebebên wê, lê me îmkân hebû ko me bikaribûya kovareke din jî derxista; gotinên kurdî ko winda bûbûn, ji goristanê hatibûn derxistin, bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin, alfabeyeke hêsan û rewan bi cîh bûbû, xortên ko ji zimanê

xwe hez dikirin û pê dinivîsîn, êdî, bi hez û coş, radihiştin pênûsê...  
Li vir di-

vê ez navê wan bibêjim û keda wan jî berpêşî xwendevanên bi sebir ên bikim. Kamuran, bira yê min ê qedere, ji Parîsê hatibû û li Bêrûdê bi cîh bûbû. Hema çî bigire her hefte me hevûdu didît.

Zimanê wî

paqij û rewan, bîr û dîtinên wî kûr û balkêş bûn. Wî ayetên dîne îslamê, yên

mîna »Tefsîra Quranê û Hedîsên Cenabê Pêxe mber«, bi zimanekî gelekî xweş, werdigerandin kurdî. Roger Lescot, dîplomat û orîyentalîstê fransizko min jê re digot »Lezgîn Axa«, hebû. Ew gelekî dostê me bû û dilê wî

gelekî bi rewşa kambax a ziman û edebiyata kurdî dişewitî. Wî bi fransizî û

kurdî bendên hêja dinivîsîn û folklorê kurdî vediguhezand ser kaxizan. Rûşen, dotma ma min a jînê, alîkara jîna min, kumandara mala min, hebû. Wê, bi navê »Rewşen Bedirxan« li ser jina kurd

bendên balkêş dinivîsîn. Benda wê »Kebanî û Mamoste« deng dabû. Osman Sebrî hebû, lawê eşîran, maxrûr û bi xwe bawer. Ji herkesî bêtir, wî, bi zimanê xwe yê paqij, pênuşa xwe ya zelal, alîkariya min dikir. Xortekî nûgihîştî, Nuredîn Usif hebû, birayê kiçik ê Dr. Nazîf, xortê çeleng ê bi bejn û bal, bi zar û ziman. Nûredîn ko di pêşa min de sunet bûbû û gava kêr lêketibû, serê xwe zîvi- randibû û ji min re, bi ken, gotibû, »Mamo kirîv, ez natirsim«, gelekî ser- wext û ziman û edebiyathez bû. Wî çîrokên gelekî xweş dinivîsîn û loma jî min jê re digot, »aexovê kurdan...« Xortekî din hebû; Qedrî Can, derketiyê Dêrika Mazî, şairê zimanê birîndar. aend seyda û meleyên me hebûn; Cegerxwîn, Mele Hesenê Hişyar, Ehmedê Namî, Mele Enwer... Wan jî, bi ş i- hîrên xwe, rûpelên edebiyata kurdî yên neçar dewlemend dikirin. Se yda Cîgerxwîn ko her carê bi qasî deh şîran, bi destnivîsa xwe ya ko bi xaçeriyên herî dijwar dişibyan, dişandin, pênuşa xwe mîna şûr ji kalan kişandibû û bi kar dianî. û niha navê wan nayê bîra min, lê hîn gelek kesên din hebûn ko dihatin alîkariyê... Hîngê çima me dê dest bi kovareke din

243

nekira û dilopeke din li behra miçiqî ya edebiyata kurdî zêde nekira? û dîsan rojêke biharê, yekê nîsana 1942-an, xweha Hawar-ê, xweha Sînem û Cemşîd, Ronahî hate dinê. Ez, yanî Celadet Alî Bedirxan, yanî neviyê Mîr Bedirxanê derketî û kurê Emîn Alî Bedirxanê li welatê xerîbiyê wefatkirî, yanî lawê welatên xerîb ko mîna Goethe, min di xewnên xwe de jî digot, »mehr licht«, hewcedarê tîrêjên ronî bûm. Min hewcedarî bi ron - ahiyê hebû. Me, kurdên jihevketî û derketî, hewcedarî bi ronahiyê hebû. Jîna kurdî ko ketibû binê bîrek e kûr û tarî, hewced arî bi ronahiyê hebû. Gotinên kurdî ko

birîndar û stûxwar bûn û di bin axa reş de mabûn, hew- cedarî bi ronahiyê hebûn.

Mehr licht... yanî hinekî din ronahî. Yanî xweha nû Ronahî. Di tariya şevê ya şer de, Rohanî zabû... Bi weşandina Ronahiyê me di tarîxa çapa kurdî de gaveke nû avêt.

Kovara nû bi sûret û resim bû. Resimên ko Cemşîd û Sînemê jê hez dikirin, rûpelên wê dineqîşandin. Bi vê kovara nû dilop dibûn dudo. Du dilopên behreke miçiqî. Lê digel her tiştî, du dilopên zelal û hênik ko hinekî tîna mirovan dişikan... du dilopên ko hebû ko rê li dilopên nû vekirina... ko hebû ko rê li min jî vekira ko min dîsan deftera romana xwe Heyveronê jiberkêşka masê derxista, kes û şexsan, dewr û dewran, war û wêran, tahm û rengan bixistina nav hev û çroka şevê ko bi tîrêjên heyveke ronî diçirûsî, binivîsa...

– Bavo, Cemşîd ji vî hez dike, Cemşîd dîsan destê xwe davêje rîha Celadet Beg û dibêje. Bavo, ev çi ye?

– Ev sîwanvanekî aza ye. Vî eskerî xwe ji balafirê avêtiye, sîwana xwe

vekiriye û pê hêdî hêdî dadikeve erdê. Te niha fahm kir?

– Himm, Cemşîd serê xwe dihejîne û destê xwe îcar dibe berçavikên bavê xwe.

Celadet Beg lawê xwe hembêz dike, wî radimûse û paşê berçavikên xwe

ji çavên xwe derdixe û wî davêje erdê û pê dilîze. Bav û law, li erdê, li ser

mehfûran, dilîzin. Cemşîd dikene. Sînem jî tê hawara Cemşîd û xwe davêje ser bavê xwe. Lê bav zora wê jî dibe. Celadet Beg zarokan mist dide, bîhn dike, hembêz dike, guh, bîvil, enî û çavên wan maç dike. Bîhna xweş a zarokan, çermê tenik ê bedena wan a mîna şitila rihanê,

kenê wan ê paqij, gotinên wan ên mahsûm...

– Bavo, bes e, bes e, Cemşîd dikene û dibêje. Min got, bes e, Cemo dibêje te, bes e...

244

5

– Bes e, spas. Garsonê bejndirêj ko bi ûsil qahwe tijî dike, bi serê xwe, silav dide û pêlepaş dere.

Celadet Beg, Kamuran Beg, Roger Lescot û Yusif Malik, li Lubnanê, li

navçê Rasel Metn ko li kêleka geliyên kûr û benderên çiyar e, di aşxaneyeye kevnar a durzî de rûniştine û qahwa piştî şîva êvarê vedixwin.

Yusif Malik, nivîskar û rojnamevanê nas û bedengirs, ko bi eslê xwe asûrî

ye û li Bêrûdê dijî, dostekî nêzîk ê Celadet û Kamuran Began e. Wî dil heye, bi navê »Alhurrya-The Liberty«, bi erebî û ingilîzî, dest bi roj-

nameyeye hefteyî bike. Wî hewced arî bi alîkariya hevalên xwe heye. Bi vê

munasebetê, wî hevalên xwe, di dereke sakîn de, ezimandine şîvê.

– Alhurrya dê bibe dengê hemî milletên bêkes û bîndest, ew, bi destê

ş ehkirî, rast dike û dibêje. Celadet Beg

xwe yê rastê, porê xwe yê ber p i paş

herdu kovarên xwe li şamê diweşîne. Kamuran Beg li vir dest bi kovara

xwe Roja Nû kiriye û du hejmar, bi kurdî û fransîzî, derxistine. Bi xêr, çaxa em jî Elhurrya bi erebî û ingilîzî derxin, hingî ev hemî dê hevûdu

temam bikin. Ew ê hemî, bi hev re, bibin kursiya jibîrbûyîyan.

Aşxana ko bêtir cîhê mal û malbatan e, hêdî hêdî, vala dibe.

Garsonên

ko cil û bergên rengîn ên durzî li xwe kirine, di navbera masan de digerin û mase vala dikin. Li ser masa Yusif Malik û hevalên wî jî, ji

çend teyfikên meze, meywe, fûl û humusê pê ve, tiştêk nemaye.

aima fûl û humus li ser masê ye? Kes pê nizane. Tevî ko kesî destê

xwe nedaye wan, ew hê jî li ser masê ne. Mase li kêleka pencereyên pir fireh e. Der di nav tariya şevê de ye, bi tenê stêrk ji esmanan diçirûsin. û carina ronahiya lampeyên ereban ji dûr ve dixuyin. Ji penceran jî agirê findên ko li ser masê ne û êdî ber bi xelasbûnê derin, dixuyê.

– şer hê dewam dike, Yusif Melik dibêje, lê dinya westiyaye, ez welê bawer im, dawiya şer jî, mîna van findan, tê. Lê em, kurd, asûrî, ermen, çerkez, cihû, filistînî, durzî, elewî, marûnî, dîsan, bêzar û bêziman,

bêxwedî û bêkursî ne. Me jî heq û hiqûq, maf û doz lazim e. Kî dê bi doza

me rabe? Heşê min tiştêkî ji dinya kambax a westiyayî nabire...

Bi gotina dostê min ê dilşikestî, lê ziravbihîstiyar, bû. Ma wexta kê, di nav agirê şer de, ji bo millet û gelên biçk û bêkes, hebû? Dinyayê »Strana Mirinê« ko min ji Lamartine wergerandibû kurdî û di hejmareke Hawar-ê de weşandibû, dinihwirand; »Yê ko tê mîna şev û roja borî ye / Carna êş û xebat û kêf û şahî / Carna ax û of û girîn / Carna di nav gul û gîhê / Carna di

245

nav ax û herî / û dawî... şeva tarî bi ser me de tê...« Di heyama strana mir- inê de gel û komên ko şelp a mirinê xwarine dikarin çi bikin?

Tu bi lihîstina setrencê dizanî... Di wan rojan de, dinya bûbû textê se-

trencê; şah û fîl û ferzîn rabûbûn hev, ew bi rim, gurz û şeşperiyar ketibûn nav hev, birc hildiweşiyar, ferzîn hêsîr diketin, siwar ji hespan, peyar ji newalan diketin û esker jî li ber lîngan diçin. Heçî milletên bêpi şt û bind- est bûn, di vê lehîstika setrencê de, esker bûn. şah û ferzînan ew dajotin pêş.

Di vê lehîsteka mirinê de, qîmeta kurdan jî, li gora awirê Tirkiyê diguherî.

Di destpêka şer de, Tirkiyê bi dewletên hevalbend re peymaneke dostiyê anî pê. Hingî buhayê kurdan ket. Lê demên dawiyê, Tirkiye

vegeriya ser siyaseta xwe ya kevn a Osmanî û bi alemanan re tifaqeke dostiyê îmze kir. Hingî jî qîmeta kurdan li nik hevalbendan zêde bû. Bi gotina kalemêran, kela şorbê rabûbû û hewcedarî bi keskê hebû!.. Di heyama strana mirinê de, qeyideyên setrencê derbas dibûn, ne tiştêkî din. Gava buhayê kurdan dîsan zêde bû, ingilîz û fransizan, mîna dewlet, nêzîkî li me kirin. Sansora tûnt hilanîn, rê li me vekirin ko em bi karên rêxistinî û çapemeniyê rabin, hin îmkanên çapê dan me. Hevalên me yê siyasî şixulên xwe yê siyasî xurttir kirin. Me jî dest bi weşanên nû kirin. Kamuran jî li Bêrûdê dest bi weşandina rojnameyeke hefteyî Roja Nû kir. Dîsan wî û hevalên wî yê kurdên Lubnanê, dest bi radyoyeke kurdî kirin. Radyo heftê du rojan, roja çarşemb û îne, li ser pêlên kurt û navîn, diweşiya. Wan ji min jî alîkarî xwestibûn. Min bendên sereke yê Roja Nû dinivîsîn û nûçeyên şer ko min ji bo Hawarê jî hazir dikirin, didan radyoyê. Loma, hema çi bigire her hefte, ez diçm Bêrûdê. Gava ez digiham Bêrûdê, min hejmara telefona Kamuran, 84 41, dizivîrand û xeb era hatinê bi wî digihand da ko ew jî bi- hata sûkê. Ji ber ko her cara ez diçm Bêrûdê, min kaxizên çapê jî bi xwe re dibirin. Kamuran dihat, me para Roja Nû ya kaxizan hildid a û yê din jî di sûkê de difiro. Hêzên hevalbend ew kaxiz didan me da ko me kovarên xwe biweşandina. Lê me nivê kaxizan bi kar dianî û nivê din jî di sûka reş de, ji bo debara xwe, difiro. Tevî ko Kamuran awikatî d i kir, Rûşenê mamostahî û min jî awikatî û tercumanî, çu carê, perê me, bi qasî qîma me, ç nedibû û mesrefa weşanan jî bêpayan pir bû.

Loma, belê bi tenê loma, qorîna quling ji derdan bû...

– Mixabin, ne ez, ne kekê min Celadet û ne jî Mr. Lescot dikarin bi ere-

bî û in gilîzî binivîsin, Kamuran Beg, bi destmaleke spî, lêvên xwe û sim-

246

bêlên xwe yê zirav paqij dike û dibêje. Jê pê ve, yanî ji vê kêmaniya me

pê ve, te çî daxwaz hebe, em bi te re ne û em ê pê rabin... Ma ne welê ye?

Celadet Beg û Mr. Lescot jî serê xwe dihejînin û wî tesdîq dikan. – Hingî ez ê tavilê dest bi xebatê bikim, Yusif Melik bi kêfxweşî dibêje, bi tenê navê we, hebûna we, ji bo rojnamê quweteke mezin e. û paşê jî ew destê xwe hildike û ji garson hesabê dixwaze.

Di wê navberê de, Celadet Beg ji berîka çakêtê xwe kaxizekê derdixe û

dide Kamuran Begê ko li hember, kêleka Mr. Lescot rûniştiye.

– Benda min e, Celadet Beg dibêje. Ji bo hejmara sisiyan a Roja Nû. Min dil heye, ez îşev vegerim şamê. Min bêriya zariyan kiriye. Tu wê werbigire û li gora dilê xwe rast bike.

Kamuran Beg kaxizê ber bi findê dike, lê dinihêre û pê re dixwîne.

– Abi, te şîra Bavo nivîsiye, ew dibêje. şîra ko Bavo ji Mamê me Mîqtet re şandibû.

Paşê jî Kamuran Beg kaxiz datîne, rûyê xwe ber bi Mr. Lescot dike û şîra dirêj, ji ber, dixwîne; p êrûz ji te re hezar cara, ev deng e niha li nav yara, mizgîniya vê cerîdeya qenc, şabaş dibîtin çiqra hebit genc... Piştî ko ew xwendina şîrê xelas dike, ew dîsan kaxizê dixwe destê xwe û lê dinihêre

û bi tenê dibêje, »şîra Bavo, şîra Bavo...«

Celadet Beg, bi ken, li birayê xwe dinihêre, dilopên dawîn ên qedeha

xwe ya konyaka courtoise vedixwe û li Mr. Lescot û Yusif Melik vedigere

û dibêje,

– Birayo Kamuran... bir ano... tarîx dubare dibe, qedera me

Bedirxaniyan hertim yek û eynî ye... Sala 1898-an, mamê me Mîdhet li

Kahîrê rojnameya xwe Kurdistan-ê diweşîne. Ew ji birayê xwe yê mezin Emîn Alî Beg ko hingî li Stembolê dijî û me mezin dike, nivîsan dixwaze. Bavê me nikare bi navê xwe binivîse, lê ew li mala me ya Kiziltoprakê, li



oda xebatê, rûdine û jê re, bi navê »Lawê şêx E. Fetah« vê şîra hanê dinivîse û dişîne. Niha jî birayê min ê biçûk, 45 salan bi dû nivîsîna şîra

Bavo re, ji min, ji bo rojnameya xwe, nivîsan dixwaze. Ma ji vê şîrê xweştir çî xwençe heye ko ez bikaribim bidim birayê x we yê biçûk?..

Kî çî

6

dibêje, bila bibêje, tarîx her dubare dibe...

Kî çî dibêje, bila bibêje, tarîx her dubare dibe, Monîka, kelgirî, li ber xwe dinihêre û dibêje. Tiştê ko di şerê yekemîn de bi me alem- anan qewimî, dê îcar jî, bi me biqewime. Tê bîra we, ga va Nietzsche

rexne li alemanan digirt, wî digot; her mirovî, her milletî du alî hene, aliyê

247

ronî û aliyê tarî. aaxa aliyê tarî zora aliyê ronî bibe, hingê jiyan ji bo wî kesî û milletî dûjeh e... Qedera me alemanan jî weha ye; tariya dûjehê, xelekên agirên dûjehê... şewat, hilweşîn, xirbe û kavilkirin, mirin û kuştin... Ez çî bibêjim?.. şerm dikim, bi tenê şerm dikim...

– Schatz Monika, li van deran, haya me zêde ji bûyeran nîn e, tiştên ko

em pê dihesin, ji destê çaran, pêncan digihên me, Kamuran Beg li Monikayê dinihêre û dibêje. Gotinên te me mat dike... çawan dibe?.. Miletêkî mîna yê aleman ko hertim bi mantik û heşliserî bûye, çawan

dikare evçend nizm be?

– Ez nizanim, ez nizanim... Na, ez dizanim, ez dizanim, lê taqeta min a gotinê nîn e. Jixwe li hember van bûyerên şer û kirinên me alemanan tu qîmeta gotinê jî nemaye... Felaket e, bi tenê felaket e... do jî weha bû, îro jî weha ye... Felaketê mohra xwe li eniya me alemanan xistiye, tu rizgarî, tu xelasî nîn e...

– Monika, xwe mewestîne, Celadet Beg ko li kêleka wê rûniştiye, destê

wê yê çepê dixê nav herdu lepên xwe û dibêje. Hinekî bîhna xwe berde, were ser xwe. Paşê em ê bipeyivin...

– West? Bîhnberdan?.. nein, nein, mein fürst... Tu behsa Monika berê

ya Munîxê dikî. Ez hew ew Monika me. West, bîhnberdan, îsrehet... evana ji bo mirovên normal in. Vî şerî tu tiştê normal nehiştiye.

Haya we

jê nîn e, ji tişteki nîn e. Ev xeberên ko hûn dibihîsin, dixwînin, tu tiştî nabêjin. Haya we ji kampên êsîran, hemamên gazê, firûnên şewitandina merivan, çalên kuştiyan, qirkirina bi milyonan cihûyan heye?.. Mein

Gott, mein Gott!..

Monîka hatibû. Hevala min a rojên Munîxê, hevriya min a dersên Nietzsche û evîna min a roj û şevên birç, ji nişkekê ve, hatibû Bêrûdê. Haya min û Kamuran ji tişteki nîn bû. Wê rojê, danê sibê, gava telefona Kamuran lêket, ez jî li mala Kamuran, li salona wî niviyabûm. Ez û Kamuran saet sisiyê şevê vegeyriyabûn malê û heta ber destê sibê, li ser gramera kurdî ko em lê hûr dibûn, xebitîb ûn. Lê b i dengê tîz ê telefonê, ez jî hişyar b ûm. Telefon ji ba- lyozxana Amerîkayê bû. Dîplomateki Amerîkayî behsa banûyeke ale- manî, Monika Karlfeld, dikir. Banû li Bêrûdê bû û li Mr. Kamuran Bedir- Khan dipirsî... Mala Kamuran li navenda bajêr, li ser kolana Weygandê bû. Bi lez, me xwe da hev û em ji malê derketin. Tevî ko rê ne dirêj bû, me texsiyek ji rê vegeyrand, em lê siwar bûn û çn balyozxanê. Piştî demeke çn û hatinê, eskerên çekdar em birin hundir. Li wir jî dîplomateki navsal

248

û b ejndirêj em birin odeyekê ko li bexç dînihêrî. Monika, di nav kincên

reş de, tûlekî reş li serî, li odê, rûniştibû. aaxa çavê wê bi me ket, wê xwe, bi carekê, avêt ser me. »Mein fürst, Celadet, du auch!« wê got û dest bi giriyê

kir... Welê dixuya ko wê nizanîbû ko ez ê jî li Bêrûdê bûma.

Monîka reben... Ew bi qasî mistekê mabû. Cil û bergên wê jê diketin.

Qermîokên enî, binçav û rû p ir kûr bûn. çav ketibûn kortê. Ji ew Monika min a çavşêrîn, bejndirêj, gerdan û bedenxweş tu tişt nemabû. Monika ku, li odê, xwe avêtibû hembêza min, pîrejineke jar, kin û reb en bû... Monika digiriya, mîna ko zelzele bi bedena wê ketibe, ew welê diheziya û bi qîrîndigiriya... Kamuran navnîşana xwe nivisî, da dîplomat û ez ketim milê Monikayê û em ji wir derketin û dîsan hatin malê.

Monika ji goristanê, ji zeviyên mirinê, ji bendera ruhistîn dihat. Wê alîkarî li tevgereke arîstokrat a alemanî kirib û da ko Adolf Hitler, bi siûîkastekê, bikujin. Lê tevger bi ser neketibû. Tevî ko gelek kes miribin û Hitler jî birîndar bûbû, tevgera arîstokratan têkçûbû. Piraniya kesên tevgerê ko ji zabitên bilind, arîstokratên kevnare û karbidestên gelekî dewlemend b ûn, hatib ûn girtin û kuştin. Monîka jî, tevî du hevalên xwe, bi hezar zehmetiyên ko nayên heşê mirovan, xwe gîhandibû girava Maltayê. Hevalên wê li wir mabûn da ko ji wir jî herin Amerikayê, ew jî, bi alîkariya Amerikayîyan, ji bo me, hatibû Bêrûdê. Kê digot ko dinya mezin e? Tu bibêje, hema piştî bîst salan, ji nişka ve, guherî, pir guherî, em gihabûn hev.

Lê tiştên ko Monikayê behs dikirin ne îşê aqilan bû. Li Rohilatê kesî behsa wan bû yeran nedikir. Bûyerên şer, li Ro hilatê, bi çend rêzên nivîskî vediguhezîn şêniyan. Hema çi bigire, haya kesî ji qirkirina miletekî, ci- hûyên derketî yên hezar salan, nîn bû. Monikayê behsa mirovan, şexsan, ruh, heş, êş, jan, pejn û dengên însanan dikir, ne ya rêzên nivîskî yên xe- berên şer... Dilê min, bi her gotina Monikayê, bi her hêstira ko ji çavên wê dibarî, diguviştî. Ji bilî »na, nab e, çawan dibe« me nizanîbû ka me dê çi big - ota. Li gora ko Monikayê digot, li her aliyên welatê alemanan û cîhên kowan

vegirtibûn, kampên mirinê hatibûn pê û di wan kampan de, her roj, bi hezaran cihû, dihatin şewitandin. Belê, şewitandin!.. Bi sed hezaran, heye ko bi milyonan cihû hatibûn kuştin. Ne bi tenê cihû, lê kesên ji milletên din û nemaze qereçî jî, bi deh hezaran, dihatin kuştin. Min û Kamuran bi birînên qetlîam û qirkirinê dizanîbû. Di salên me yê xortiyê de, milyon û nêvekê ermen û sê sed hezar kurd qir bûbûn. Me bi bîhna hilma mirinê dizanîbû. Loma jî her gotineke Monikayê dibû kozeke agir.

249

Cihû... Hê di sala 1942-an de, di şeveke pûk û seqemê de, min bendeke

dirêj, bi gotinên nîvmirî yê kurdî, bi navê »Zilamek û Zimanek« nivîsî û tê de qala serpêhatiyên cihuyan, Tewrat, zimanê wan ê mirî, vejandina zimanê wan û Elyêzer bin Yehûda, mêrxasê ko ziman vejand, kir. Ew bend, yek ji nivîsarên min ê herî baş e. Ji ber ko min ew, di şevên tarî de, bi hevaltiya kuliyan spî yê berfê, bi hemû hîs û kela xwe, nivîsî. Hê niha jî tê bîra min, tê de, min weha digot; »Yehuda ferhenga milletê xwe çkir û bê- jeyên ko di zimanekî mirî de nîn in, ew jî pêk ve anîn. Zimanê îbranî jî di nav cihyan de belav bû. Di sala 1922- an de, gava Elyêzer bin Yehûda mir, zimanê îbranî yê ko berî 30-40 salî zimanekî mirîbû, bûbû zimanê miletekî. Ev ziman îro di Felestînê û di rex erebî û inglîzî de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikumetê ye jî...« û paşê jî min tê de weha digot, »îro hînbûna xwendin û nivisandina zimanê mad er ji bo her milletî êdî ne bi tenê wezîfeyê şexsî lê wezîfeyê milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne wezîfa xwe ya milî pêk ve neanîne û bi kêrî milletê xwe nehatine« û min li kurdanşîret dikir ko ew ji Elyêzer bin Yehûda dersan werbigirin... Me dê çi bigota? Me bi tenê li Monika xemgir, hevala min a comerd ko di nav bîst salan de bûbû pîrejineke porspî, guhdarî dikir... Xelekên agirê şer bi canê cihyan ketibû. Cihû dişewitîn, dûmana ko ji cendekên wan bilind dibû, bi esman- an digihîştin...

Monika ava ko Kamuran Beg aniye vedixwe, ew çend tayên porê xwê yê kin û spî ko bi ser çavên wê ketine, dide alî, serê xwe radike û li hevalên

xwe yên salên bîstan dinihêre. Ew, bi nêrîneke kûr, lê vala, dixwaze bikene. Lê nabe. Qermîokên rûyê Monikayê halê wê dide dest. Ji der ve, dengê ereb e û şênîyan tê. Kamuran Beg radibe û pencerê digire. Monika

çavên xwe yên werimî li salona biçk digerîne. çavê wê bi hersê fo- tografên ko li ser masa xebatê ya Kamuran Beg e, dikeve. Yek ji fo-

tografan a Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyetê ye. Emîn Alî Beg û Samîha Xanim rûniştine, Meziyet jî li paş wan, li pê sekiniye. Fotografa dudiyan a malbata Celadet Beg e; ew, Rû şen Xanim, Sînem û Cemşîd bi hev re ne. Sînem û Cemşîd li ser çogên bavê xwe rûniştine. Fotografa din jî ya Safter e. Di nav çarçeweke zêrhêlî ya biçk de, Safter li pê sekiniye, lingê xwe yê rastê daniye ser darekê, xwe xwar kiriye, destê xwe daniye ser çoga xwe ya rastê û dikene.

– Cara dawîn, min Safterê rûken di bihara sala 1941-an de ziyaret kir,

Monika bi destmaleke fireh, bîvila xwe paqij dike û dibêje. Ez û Pêlikanê

250

ko bi rojnamevanekî nas re zewicîbû, bûbû xwedî du zarokan û navê lawê

xwe Safter lêkirib û, çn Haidelbergê, ser tirba Safter. Ew şitilên sorgulan

ko Pêlikanê çandibûn, mezin bûbûn. Sorgulan bîhn didan... Piştî wê ro-

jê, min hew Safter û Pelikan dîtin. Paşê min bihîst ko Gestapo Pelikan jî girtiye, lê ez nizanim ka xeber rast bû yan na. Eger rast be jî çi bi serê wê

de hat? Ez pê nizanim. Misîbet, misîbetên ko li me qewimîne, nayên

gotin... Ez şerm dikim... ez... ich...

Monika nikare gotina xwe dewam bike. Ew dîsan dest bi giriyê dike.

Bi

qîrîn û zarîn. Celadet Beg dixwaze jê re tiştêkî bibêje, lê Kamuran Beg nahêle, ew bi destan îşaret dike da ko ew bihêlin, Monika bigirî.

251

252

FOTOGRAF 15: Ela bela bin mehmûdî... Her yer karanlý

k... Je t-entende toujours, son tour... Ka banê me yê ezîzan, kanî war, kanî lo lo, lê lê li ku, kanî deng...

1

Xezal... çavên wê...

Fotograf 15 -an a gelekî biçûk e. Heye ko ew biçk - tirîn

wêneya hemû romanê ye. Di vê fotografê de çar kes hene; Celadet Alî

Bedirxan, du eskerên reşik ên fransîz û yekî din. Serê kesê çaremîn ê fo-

tografê ko kincên siwîl lê ne, nexuyaye. Roger Lescot, fotografkêşê vê fo- tografê, serê kesê çaremîn dernexistiye. Hemû bedena girs heta qirikê di

fotografê de ye. Lê serî nîn e. Ew kî ye? aima serê wî derneketiye?

Kî pê dizane! Lê di vê fotografa biçk a reş û spî de, tiştê herî balkêş xezaleke biçûk e. Xezaleke biçk ko di nav destên eskeran de, li ser erdeke qiraç, bi çavên gelekî balkêş, li kamerayê dinihêre. Esker jî li ser totikan rûniştine û bi kêfxweşî li kamerayê dinihêrin. Ew dikenin. Ew bi ser ke-

tine; xezal, bi saxî, hatiye girtin. Ew xezala girtî, bi serfirazî, nîşan didin.

Heçî Celadet Beg, rengê rûpelên Bîra Qederê, ye, li pê ye. Lê ew li ser

xezalê xwar bûye û xezal, ji stirîhan, pêgirtiyê û li kamerayê dinihêre. Ji

rawestê dixuye ko kesê çaremîn ê bêserî jî li kamerayê dinihêre. Xezal navenda vê fotografê ye. Heye ko loma, yanî ji bo ko xezal baş bixuyê,

kesê çaremîn bêserî derketiye. Roger Lescot ko ji hal û hewalê fotograf û fotografkişandinê nizane, çavika kamerayê di ser xezalê de rawestandiyê.

Pêwendiyêke xurt di navbera kesên vê fotografê û kamerayê de heye.

Hemû bi dîqet li kamerayê dinihêrin. Xezala biçk jî, matmayî, li kamerayê dinihêre.

Lê xezal û nêrîna wê... Xezal di nav destan de ye. Destên ecêb, xerîb û

nenas ew ji qiloç û lingan girtine. Kesên nenas li dora wê civiyane û wê, maxrûr û serfiraz, nîşan d idin. Ew girtî ye. Di vê kurtedema kişandina fotografê de ew çî hîs dike? Kî dizane! Xwezî zimanê wê yan jî zimanê vê fo-

253

tografê hebûya û bikaribûya hîsên wê, ji bo xwendevanên Bîra Qederê,

bigota. Lê mixabin, fotograf napeyivin, ew bi tenê nîşan didin. Ev fo-

tografa ko Mr. Lescot bi kameraya xwe ya biçk, bi lez û ji bo Florens û Rewşen Xaniman, kişandiyê, du çavên germ, şêrîn û reş ên xezalê nîşan dide. Nêrîna xezalê ecêb germ e, bêpayan kûr e. Lê di eynî wextê de, nêrîna wê sar e, pir sar e.

Xezal ditirse. Xezal dîl e, bêgav û bêare ye.

Nêrîna wê nêrîna dîl, bêgav û bêçaran e. Fotograf a ko dê bibe xatirayêke biçk a salên ber bi 1950-an, nêrîneke zîz berpêş dike.

Herdu eskerên reşîk, di nav kincên xwe yê boz ên eskerî de, li dora xezalê rûniştine û dikenin. Di nêrîna wan de, biserketin heye, serfirazî û

kêfxweşiya gihîştina hedefan heye. Lê di nêrîna Celadet Beg de ko di

navbera herdu eskeran de rawestayê û bi destan ji qiloçn zirav ên xezalê girtine, ew kêfxweşî û serfirazî naxuyê. Ew xwar bûye û li kamerayê dini-

hêre, bi tenê dinihêre. Nêrîna wî ne mîna nêrîna xezalê ye ne jî mîna ya

eskeran. Bi tenê aram û nerm e. Kincên ko li ser wî ne, yê seyde û nêrînan e. Ew jî mîna yê eskeran, boz in. Porê wî yê ko ji pêşiyê hinekî weşiyaye, ketiye ser eniya wî û eniya fireh girtiye. Porê wî spî dike. Herweha simbêl û rîha wî jî. Qelîşek û qermîokên rûyê wî gelekî kûr in. Rengê spî yê pay-

izê ko hew germ dike, bi ser Celadet Beg de girtiye. Celadet Beg kal û westiyayî dixuyê. Nêrîna wî nêrîneke kal û westiyayî ye.

Di vê wênê de baş dixuyê; kalîtiyê rengê Celadet Beg guherandiye û bi

rengê xwe yê taybetî yê spî ew, ji nû ve, neqîşandiye. Mr Lescot ko vê fo- tografê, bi serfirazî, ji bo bermaliya xwe û ya Celadet Beg dikişîne, bêyî

ko haya wî jê hebe, nêrîna west û kederê jî dikişîne. Ew, bi nezanî, şahîdiya west û kedera çavan jî dike. Herwekî ko hatiye gotin, di neqşên

her fotografekê de çend alî û çend reng hene, -wekî vê fotografê nû ya

Bîra Qederê.

Nêrîna germ û sar a xezalê û nêrîna westiyayî û kal a Celadet Alî Bedirxan. Nêrînen du qederan. Na, heye ko nêrînen qederekê... Kî dizane?..

2

Kî dizane? Heye ko nêrînen Celadet Beg û Ehmedê Fermanê Kîkî,



nêrînên du qederên cihê yên kurdî, mîna hev in. Heye ko ew mîna hev difikirin jî.

şev e, bêdengiya şevê ye. Di nav bêdengiya şevê de dengê nerm û tenik

ê bilûra Ehmedê Fermanê Kîkî ye. şam e, goristana belengaz a Taxa 254

Kurdan a bajarê îslamê ye. Tirba Mîr Bedirxan, bapîrê Celadet Beg e.

Celadet Beg û bilûrvanê wî, demançe li piştan, hatine ser tirba Mîr. Mîna gelek caran, îcar jî, Celadet Beg hatiye nik kalikê x we da ko pê re li ser hal û hewalê xwe bipeyive. Tiştên ko ew nikare bi kesî re bipeyive, ew tê û bi

bapîrê xwe re dipeyive, jê re dibêje.

Wî gora bapîrê xwe daye çêkirin. Gor bûye mîna maleke biçk, her çar

alîyên wê bi qorên keviran, bi dîwaran lêbûye, banekî biçûk jî rakişiyaye ser. Gor bûye ziyaretgah, cîhê xwestek û mirazan, gazin û armancan. îşev, di vê bêdengiya şevê û şewqa stêrkan de, Celadet Beg çiraya b içk a gazê ya tirbê vexistiye, li ber serê Mîr rûniştiye û geh li kaxizên ser ço ga x we, geh li tirbê, geh jî li bilûrvanê xwe dinihêre. Bilûrvan jî li ber lingên Mîr rûniştiye, geh dibêje, geh lêdixe.

Bilûrvan li bilûrê dixê û difikire; li jiyana xwe ya kal, li qedera xwe ya bi

bal difikire, li gundê xwe, li xaniyê xwe yê gund difikire. Xanî bi qorên kevirên reş lêbûbû. Mîna hemû xaniyên gund. Reşahiya dîwaran di bin

tîrêjên royê yên danên êvaran de, mîna p îştâ şûr, dibiriqî. Hundirê malê, ji karîte û mertekan heta rojîn û teqan, bi rengê spî, siwaxkirî bû. Ji rojîn

û teqan, hertim, çend kulm ronahî direşiha hundirê malê. Her du salan

carekê, ji bo temamkirina ahenga rengên reş û spî, mal siwax dibûn. Mal,

malên jiyana kurdî ya neçar bûn. Axur li kêleka malan bûn, pez û dewar, hesp û mehîn, mirîşk û dîk, seg û tajî, her, bi wan re bûn. Li malê mehfûrên ko ji aliyê jinebî û pîrejinên gund hatibûn hûnandin, raxistî bûn. Ew rengên wan ên germ! Zerahî û sorahiya wan a şewatê! Ew neqşên wan ên basîd, lê yekta! aima ev nivîskar, zane û alîmên ko tîn mala Mîr Celadet rojekê narin wan gundan? Ew hertim behsa rengan, neqşan dikin, lê çima ew narin gundê ko xwediyê xaniyên reş û spî ye û

piştta xwe daye çiyar? aima? Argûn û bixêriyên malê hertim ronî û germ

bûn. Gulok û xêlekên agirê êzingan ji wan ber bi jor dibûn. Ferşên do- raliyên argûnê, ji agirê sor, sor dibûn. Di şevên zivistanan de agirê gur govend digirt. Govendeke bêpayan ko çavê merivan tu carî jê nedibû.

Paşê, li dîwarên malê, tifing, xençer, qiloçn xezal û pezkoviyan û bilûr

hilawestîbûn. Tifingê ew diparastin, xençerê riya tarîx, bav û kalan, qiloçn xezal û pezkoviyan jî riya zozan, gelî û çiyar nîşanî wan didan. Herç bilûr bû, jiyana wan bû, dengê dewr û dewranên wan ên jibîrbûyî bû. Bilûr sir û sihêrên wan bû. Herçend xaniyê wan li ser hîm, stûn, kutek û karîteyan ava bûbû, jiyana wan a gund jî ewçend li ser deng û

awazên bilûr û bilûrvanan ava bûbû.

255

Dengê bilûrê; dostê teyr û tilûran, hevalê bayê çiya û zozanan. Bilûr;

stûna şevbihurkên mîran, beg û giregir an, yara bêpayan a şevên dirêj ên zivistanan ko li dora agirê argûnê dibihurîn.

Celadet Beg, neviyê Mîr, li bilûrê guhdarî dike û difikire û bi hêdîka »werin« dibêje; heş û bîr, deng û pejn, bîranîn, bîranînên jîneke pere - gende werin, werin dora min, ew dibêje. Rojên

zarokiya min a germ ko niha bûne siya min, hûn werin. Kiziltoprak,  
Moda, Kadikoy, Ca

đalo

đlu,

Pera, Galata, Cadeyî Kebîr, hûn werin. Bîrên cihê yê qedera min,  
bîra bexçê mamê min Bedrî Paşa, bîra mala Kiziltoprakê, ya  
pansiyona Ca

đalo

đluyê, yê Munîxê, yê Safter û Bedirxan, ya mala kekê min  
Sureya, yê Bêrûd, şam û Helebê, yê ko niha nayên bîra min,  
hûn werin, hemû werin. şehrîban, Saadet Abla, Canan, Monika,  
yê din ên şevên ronî û geş ên Stembol, Munîx, Parîs, Bêrûd û  
şamê, hûn werin. Rûşen, pîrika min, Rûşen, bermalî û hevriya jîna  
min, hûn werin. Amojna Stî, Madam Stella, metên min, beg û banû,  
madam û musyoyên ko niha nayên bîra min, hûn werin. Mamên  
min, pismamên min, hûn werin. Safter, Sureya, birayên min ên  
gorbehîşt ko li diyarên xerîb radizên, hûn werin. Bavo, hîm û stûna  
bingehîn a bîranînên min, bavê

min ê ruhşad ko li welatekî xerîb dinive, tu were. Dayê, Meziyet, çi  
dibe,

hûn werin, ji Stembolê siwar bin û werin. Heval û dostên min ên  
mirî û

kuştî, h ûn werin. Hûn hemû bi hev re, ji gor û tirbe, war û şûnên  
xwe ra-

bin û werin nik min, nik bapîrê min Mîr Bedirxan û ji min re bibêjin  
kaCeladet Alî Bedirxan kî ye... Ez ketime bextê we, werin û bibêjin.

Ew nedihatin, mixabin. Lê bîr û heşê min, tevî dengê bilûra  
kalemêrê delal Ehmedê Fermanê Kîkî, diç nik wan. Ez diçm nik  
bapîrê xwe, ser tirba wî da ko ji wir jî biçim nik kesên ko te li jor qal  
kirin. Serdanên min, roj bi roj, zêdetir dibûn, hema çi bigire her  
hefte, ez diçm nik bapîrê xwe, li ber serê wî rûdiniştim û bi saetan  
difikirîm, -yan jî min dinivîsî. Min çyina şevê ter- cîh dikir. Ji ber ko  
hingê kes nîn bû, ji deng û pejnên windayî û mirî pê ve, tu deng

nedihat. Jixwe goristan ji mala me zêde ne dûr b û. Gava bajar bi temamî dikete xewê, ez radibûm, min xwe dida hev, berik dibir devê de- manç û ew girêdida, dad iketim hewşê, diçm oda Ehmed û ew jî hişyar dikir û em bi hev re diketin rê. Na, min çewt got, em nediketin rê, em, ne- feshikyayî, hildikişiyar kaşên taxa kurdan. Gora Mîr mîna mezeleke biçûk bû, çend cîhên rûniştinê û çirayeke biçûk a gazê tê de heb û. Min çira

256

vêdixist û li kalikê xwe yê ko min tu carî nedîtibû, lê hertim bihîstibû, dini- hêrî.

Tirba Mîr bûbû mala min a did uyan. Herwekî ko hatiye gotin, di kalîtiyê

de, ling mirovan dibin gor û goristanan. Lingên min jî ez dibirim nik bapîrê min. Jê pê ve, cîhê ko ez biçma nîn bû. Ji wan carên pir pêwist pê ve, ez danediketim bajêr. Hem pere nîn bû hem jî xeter bû. Hem jî ma min ê li ba- jêr kî bidîta? Der û dora min, dîsan vala bûbû. Şer bi milyonan kuştî, bi milyonan sêwî, bi hezaran gundên kivil, bi sedan bajarên şewitî, Austwich, Nagazakî, Hîroşîma li pey xwe hîştibû û xelas bûbû. Hîtler, Musolînî, nazist, faşist çûbûn. Dewletên hevalbend û Yekitiya So wyetê bi ser ketibûn.

Belê, şer xelas bûbû, lê em jî xelas bûbûn. Êdî hew hewcedarî bi me hebû. Kurd dîsan ketibûn b er lingan. Êdî ew ne eskerên lîstika setrencê bûn jî. Kela şorbê çbû, bihayê heskê bûb û perekê... Dinya dîsan, ji nû ve, par dibû. Lê dîsan ji bo kurdan tu cîh û war, di vê parkirina nû de, nîn bû. Dîsan Tirkiyê nêzîkî li serdestan, ingilîz û fransizan, kiribû. Pêwendiyên wan dîsan baş bûbûn û kurd ji bîr bûbûn. Min ji tecruban dizanîbû; jibîr- bûyin mirin bû. Mirinê dîsan dor li kurdan girtibû. Li Iraqê ingilîzan, bi tanqû b alafiran, dirêjî kurdan kiribûn û ew şikandibûn. Li îranê, ingilîz û rûs li hev hatibûn, piştgirtiya rejîmê kiribûn da ko rejîm ko mara biçk a kurdanko li der û dorên bajarê Mihabadê hatibû pê, bişkîne. Rejîmê komar şikandibû, gelek kes kuştibûn û serekên komarê jî bi d ar ve

kiribûn. LiTirkiyê jî bi tenê tirs û tarîtî h ebû. Tu kesî nikarîbû behsa kurd an û mafên wan bikira.

Heçî em, welatê Sûriyê û kurd bûn, mirin, tirs û tarîtiyê bi ser me de jî girtibû. Fransiz çûbûn. Wan qewlê xwe yê 1941-an bi cîh anîbûn û îstîqlal dabûn Lubnan û Sûriyê. Hêzeke biçk a siwîl û çekdar mabû, lê yên din, her tiştên fransizî, çbûn. Hukim ketibû destê ereban, ordiyeke milî ya bi quwet dihate pê. Bîr û baweriyên nasyonalist yên Michel Eflak, filîso fekî ereb ko bi eslê xwe file bû, fireh dibû. Cîh li k urdan, roj bo roj, teng dibû.

Rewşa min? Ez nizanim ka ez çi bibêjim...Tu dizanî, sîh û sê kilamên hirçê

hene, hemû li ser dara hirmê ne. aîrokên min jî welê b ûn; hemû li ser neçarî û bêgaviyê bûn. Ez mîr bûm, law û neviyên mîran bû m, lê her û her neçar û bêgav bûm. Herwekî kurdan, cîh li min jî teng dibû. Piştî ko ingiliz, fransiz û tirk nêzîkî hev b ûbûn , hew me dikarîbû weşanên xwe b idoman - dina. îmkan nemabûn û rê li me hatibû girtin. Bi d ilekî şikestî û b i hêstirên çavan ko tu carî bi gotinan nayê îzeh kirin, me deriyên Hawar, Ronahî ûRoja Nû girtibûn. Me ew danîbûn ser refan. Radyo jî hatibû girtin. û bira, 257

heval û dostên min jî, yek bi yek çûbûn. Pêşî Monika, dosta min a zirav û bi-

hîstiyar ko bi tenê hestî û çerm mabû, çûbû. Piştî çend mehên xweş, lê ke- sertijî yên Bêrûdê, wê berê xwe dabû Amerîkayê û çûbû.

Digel ko şer xelas

bûbû û ew dikarîbû vegeriya welatê xwe, wê »Ez hew pê li wan erdên bi

xwîn dikim« gotibû û riya Amerîkayê dabû ber xwe. Paşê jî piraniya dostên min ên fransiz, tevî Pierre Randot û Peder Thomas Bois, çûbûn. Piştî wan jî Kamuran, heval û hevriyê min ê daîm, gotibû, »Mirov hew dikare li van de-

ran bijî û çûbû Fransê. Kirîvê min Nuredîn jî ko li Unîwersîta Fransizî  
ya Bêrûdê dixwend, riya Lozanê dabû ber xwe û çûbû. Heval, dost  
û nasên  
mayî jî, her yek, bi derekî de pekiyabû. Kewên me yê hewşê ko  
şênahiya  
zariyan bûn, jî çûbûn. Min ew azad kiribûn. Dido ji wan vegeziyabûn,  
lê yê din çûbûn. Sar û seqema mirinê û zivistanê bi ser me de  
girtibû. Legleg û hehecik jî çûbûn.  
Herkes çbû. Wext, wexta koçê bû. Kî mabû? Eger em min, Rûşen,  
diya wê, Huseyma, Sînem û Cemşîd ne-  
hesibîn, kal û pîr û mirî mabûn. Kesên bêquwet û bêtaqet mabûn.  
û Mîr Bedirxan mabû.  
Bilûrvan gewriya xwe, bi xweziya xwe, şil dike, zimanê xwe li ser  
lêvan di- girîne, bîhna xwe berdide û dîsan bilûrê dibe devê xwe û  
lêdixe û difikire; umir gihîştîye sedî, sed salên rengîn ji ser wan  
rojên zaroktiyê bihurîne...  
ew difikire... li gundê zaroktiya xwe, li bêriyên gund difikire.  
Xaniyên gund, mîna lat û zinaran, piştî xwe dabûn çiyayê asê û  
bilind. Di şevên aram ên gund de, çiyê bi heyv û stêran re hevaltî  
dikir. Serê çiyê warê  
teyrên eylo û bazan bû. Hêlînên wan li ser tehtên asê yê çiyê bûn.  
Ji çiyê  
dengê ba û baranê, eylo û bazê dihat. Di danên êvarê yê biharan  
de, ga-  
va şivanan keriyên pêz ji çêrê dianîn, teyrên eylo û bazan jî, mîna  
mûyekî,  
xwe ji tehtan berdidan jêr. Wan xwe nedilivandin, nedidan per û  
baskan, bê hereket, hêdî hêdî, xwe berdidan jêr. Pez dihatin.  
Wexta bêriyê bû. Keçên xama yê gund, ew keçên bedew ko her  
nêrîneke wan bi umrekî  
bû, elb û sitîl di destan de, ber bi wan diçn. Guhanên miyan tijî şîr  
bûn.

Bêrîvanên ko memikên wan mîna sêv û purtaqalan bûn, diçn ber guhanên miyan... Dengê teyran, mî û bêrîvanan dikete nava hev. û

dengê bilûrê. Bilûra şivan û bilûrvanan...

Celadet Beg, begzadeyê Stembolî, lê bavê Sînem û Cemşîdê şamî, li dengê bilûra Ehmedê Ferman guhdarî dike û rûpeleke kovara xwe Hawar-ê ko hew derdikeve, vedike û bi hêdîka çend rêzên şîreke dirêj

258

dixwîne; kanî Cûdî, ka Herekol, ka Kepir? Ka zozanên Mîr Bedirxan, bavê Têlî, ka kê bir? Ka banê me yê ezîzan, kanî war? Kanî lo lo, lê li

kû, kanî deng?..«

Ew hêdî hêdî, mîna ko di xewnê de dipeyive, şîra xwe dixwîne. Piştî ko

ew şîrê dixwîne, ew dîsan rûpela kovarê digire, kovarê datîne ser çogên xwe û li gora kalikê xwe dinih êre û dib êje; kalo, Garîbaldiyê kurdan, mîrê

asî û serhildar, serekê dîlketî û derketî, tu bibêje, ez ketime bextê te tu bibêje ka ez kê me, ez li van deran çi dikim, jîna min ber bi kû de diçê? Bibêje, ji bo Yezdanê Pak bibêje, ka Cizîra Botan, welatê te, warê bav û

kalan? Tu li vir dinivî, bavê min, yanî lawê te li Kahîrê, neviyê te Sureya li Parîsê, Safter li Heidelbergê, law û keçên te li Stembol, skûdarê... ya ez, bibêje min, ya ez ê li kû binivim? Wesiyeta Bavo ew bû rojekê ew bigi- hê welatê x we û li kêleka aemê Dijlê, di bin axa welatê xwe de binive. Wî gotibû min ko ev wesiyeta te bû jî... Lê ka? Lê ya ez? Axa reş a kîjan we- latî dê min veşêre. Ez dizanim, wext tê, sîha reş a çyinê ber bi min tê, ez nêzîkî li we dikim, lê tu bibêje min, kîjan ax, kîjan erd û welat? Kîjan...

Ew nikare gotina xwe bi dawî bîne. Ew bi hêdîka diheze û digirî. Bi

hêdîka, bi şermîn. Di bin perda dengê bilûrê de, dengê giriya wî  
nayê bi-  
hîstin. Lê ew digirî.

3

Canan digirî. Di bin perda dengê musîka Mahler de,  
dengê girîna wê nayê bihîstin, lê ew digirî. Girîna Cananê jî dibe  
perçeyekî ji rîtm û melodiya musîka Mahler. Celadet Beg, bi  
tenê, bêdeng, lê

dinihêre. Ew ji birayê xwe Kamuran hîn bûye; gava yek digirî yan jî  
dixwaze bigirî, ew hew rê lê digire. Ji bervajiyê, ew dihêle ko girî  
bibin hê- stir û ji çavan d erên. Celadet Beg li rû û porê yara xwe ya  
rojên Stembolê

dinihêre, li çavên reş ên yekta dinihêre. çav û rû neguherîne. çav  
dîsan mîna çavên xezalan xweş û germ in. Rû hê jî ciwan û spehî  
ye. Bi tenê

tayên spî bi porê wê ketine. Lê tayên spî jê tu tişt nebiriye, ji xweşiya  
wê

tu tişt kêmbûye. Tayên spî ew kiriye xanimeke kamil.

Canan, yara xewnan, ji xewnan derketiye û dîsan hatiye. Qederê,  
yan jî

felekê, yan jî meriv dikare bibêje tarîxê ew, dîsan, pergî hev anîne.

Pi ştî

şanzde salên dirêj, bi taybetî ji bo dîtina Celadet Beg, Canan hatiye  
Bêrûdê.

– Derew e, kî dibêje ko ew bi xwe û bi qedera xwe dikare, derewan  
dike,

Canan bi zehmetî dibêje û digirî. Ne em, lê qeder e ko bi me dilîze.

Ne em, lê qeder e ko bi pêşerojê dizane.

259

Hêstir ji çavên wê tên. Tevî hêstiran bîvila wê jî tê. Ew destê xwe  
davê

çanta xwe ya kêleka xwe, lê paşê bi destê xwe bîvila xwe paqij dike.



Celadet Beg li dora xwe, li t kber n mala Kamuran a B r d   
dinih re. Li

ser masa xebat , li k leka fotografa Em n Al  Beg, Sam ha Xanim    
Meziyet ,  end destmal n kaxiz li ser hev in. Ew radibe   radih je  
yek   

w , b deng, dide Canan .

– Meziyet  pir silav dikirin, w  dixwest ko ez, ji aliy  w , r    eniya  
te,

 av   b bik n  av n te ram sim, Canan b vila xwe paqij dike    
dib je.

W , wan, herkes  pir b riya te kiriye. Meziyet j  haziriya hatin  dike.  
Eger

pasaport bidin , ew   were ziyareta te. Celadet, ax Ceco, heval   
min  

abad n!.. Tu bizanib  ka me  i ki andiye! Em neketib n  er, l  rew   
ji ya

 er  xirabtir b ... pere n n b ,  mkan n n b , xwarin   vexwarin n n  
b ,

zor   zilum, tirs   xof b payan pir b  . Min li aliy  Kadikoy , di l sek   
de

mamostahiya fransiz  dikir. L  xwendevan k m b n, der   dor girt   
b n,

a xane   qahwexane vala b n. Deng ji kes  dervediket. Xweliya  
mirin  li

ser Stembol  re iyab .  ev re    tar  b n. Ecneb  j  winda  
b b n. Dewlet , bi nav  »vergi kanunu«, ti tek  n  derxistib    p   
ecneb  pir

di  andin. Ax Ceco, heval  j na min... Ceco...

Ew weha dib je   digir . – Sevgili Canan, a

 lama, sak nle , Celadet Beg dib je. B hna xwe

berde, em   h d  h d  bipeyivin. Sakin be, megir ...

L  ew digir , ji pencer  li xaniy n doral , li pencerey n wan dinih re  
 

digirî. Dengê senfoniya nehan a Mahler, bi rîtm û aheng, bilind dibe. Musîka Mahler ko bi bi ruhiyeteke nû ya sedsalan bîstan hatiye pê û hîtabî ruhê însanê sedsala bîstan dike, niha dibe pardara girîna Cananê ko dilşikestî û poşmam vegeyriyaye Bêrûdê.

Heye ko dilşikestî û poşmam ne gotinên rast ên haletê ruhiya Cananê bin. Tu dizanî, gotin divê di cîhê xwe de bi kar werin. Ew ne zêde bin, ne jî kêr. Ne pir germ, ne jî pir sar. Ne pir dûr, ne pir nêzîk. Ne comerdiya wan, ne jî çkosiya wan di cîh de ye. Tiştê ko ez di umrê xwe yê peregende de, hîn bûm, ev bû; hostahiya gotinên kurdî yê wî wîndî û perçiqî. Gava ez ketim nav derya gotinên kurdî û noqî kûrahiyên wê bûm, hingî min dît ko her gotinekê jî can û ruhek heb û. Gotin jî mîna min û te bûn. Ew jî dizan, di-jiyan û dimirin. Lê gotinên kurdî, mîna yê xelkên din, nedimirîn. Ew di- hatin kuştin. Gelek ji wan hatibûn kuştin. Gelekên wan hatibûn birîndar kirin. Zimanê kurdî bîrîndar bû, birînen wî xedar bûn. aaxa min, mîna

260

hekîmekî, birînen wan derman kirin û merhem danîn ser, min dît ko ew jî, mîna min û te, digirîn, dinalin û dinehwirin. Loma ez dibêjim, mirov divê bi qedir û qîmet, bi rêz û rêzdarî nêzîkî li wan gotinên muqedes bike, li wan hûr be û wan di cîh de lêke.

Gotin jî mîna şitilên gulên in; ji wan re hawayê paqij, tava geş, ava zelal,

axa nerm, erdê avî û nêrîneke rêzdar divê.

Eger ez vegeyrim ser wan rojên ko Canan, dîsan, ji nişkekê ve, hatibû, ez

ê bi tenê bibêjim ko Canan zîz bû. Gotina zîziyê li wê û wan rojan tê. Ew hertim kelgirî bû, serê her gavê digiriya. Hêviyên wê şikestibûn, hedef û mirazên ko wê dabûn ber xwe, yekcar, wîndî bûbûn. Ew jî, mîna gelekên me, bi ser neketibû. Wê hê nû fahm kiribû ko jîn bi xwe têkçûn bû, ne tiştêkî din...

Ew çawan û çima hatibû? Ma hewce ye ko ez dirêj bikim? Ew ji bo min

hatibû. Wê dev ji Tirkiyê berdabû û li ser riya Parîsê bû. Lê wê riya xwe li Bêrûdê jî xistibû da ko min bibîne û bi min re bipeyive: Wê dixwest ko em bi hev re biçna Parîsê, ji cîhê ko me terk kiribû, ji nû ve, dest pê bikira... Canana min ko hê jî digot »Ceco...«

Heçî çawan hatina wê bû, rojeke havînê ya germ, serê sibê, telefonê

hat. Telefon ji otêla ko min mîna navnîşan bi kar dianî, dihat. Ez li şamê, li malê bi tenê bûm, bîhna min teng, nefesa min çikiyayî bû. Wî danê sibê, min deftera romana Heyveron-ê ko min dixwest binivîsa, ji çavika masê derxistibû û danîbû ser masê. Lê pê nûs nedigeriya. Min dikir, nedikir, gotin nedihat. Ew gotinên ko bûbûn zariyên min, wê rojê, ji malê û oda xebatê reviyabûn. Min bi tenê li rûpela spî û vala a defterê dinihêrî... Li milêdin, pere nemabû. Rûşenê zarok hildabûn û ew çûbûn aliyê Latziyê, gun- dekî biçk ko jê re digotin Banias. Li wir havîngeheke dostê me Elî Axayê Zilfo hebû. Rûşen û zarok çûbûn wir. Lê pereyên wan xelas bûbûn û wan xeber şandibû da ko min hinekî pere peyda bikira û bişanda. Min ji dostekî xwe tika kiribû ko hin pere bida min. Gava telefon hat, min welê bawer kir ko ew dostê min bû. Lê na, ne welê bû. Ji Bêrûdê telefokeneke girîng, ji bo min, hatibû, resepsiyonîstê otêlê dil dikir ko ez biçma otêlê. Otêl li kêleka Meydana Salihiyê bû. Ez çim otêlê. Lê li wir jî ez hîn nebûm ka kê ji Bêrûdê telefon kiribû. Jinek ko ji Stembolê hatibû, telefon kiribû û daxwaz kiribû ko ez, zûtirîn wext, biçma Bêrûdê. Kî bû? Jinek ji Stembolê? He şê min çû ser diya min û Meziyetê. Heye ko ew bûn... yan jî yek ji wan... Yan jî meteke min, yan jî dotmameke min. Kela heyecanekê bi min girt; naseke min, bibîhna Stembolê, ji Stembola min hatibû!

261

Min qet bi bîra Cananê nebir. Ez divê li xwe mikur werim; min Canan ji

bîr kiribû. Piştî çûyina wê, min xwe gelekî êşandibû da ko min wê û êşa çûyina wê ji bîr bikira. Jixwe min deftera ko wê li Stembolê dabû min û min tê de dengên doralîyên jîna xwe reşandibûn ser

kaxizên spî, winda kiribû. Min hewl dida ko Canan û xeyalên Cananê jî winda bûna. Bi wextê, bi zewac, hatina zarokan, weşîna kovaran û keft û leftên jîna rojane, hêdî hêdî, Canan jî, mîna deftera xwe, winda bû... Wext dermanê her birîn û ê şê bû.

Lê Canan di wexteke welê de ko min hî nedipa, dîsan, hatibû. Gava danê êvarê yê eynî rojê, piştî ko min ew pereyên ko dostê min ê bidana min, jê wergirtin û ez çûm Bêrûdê, dewsa dê û xweha xwe, min Canan dît. Canan, di nav cil û bergên xweş û reş de, li buroya dostê min Yusif Melik, rûniştibû. Meziyetê hemû telefon û navnîşanên min û dostên min dabûnê. aaxa min derî vekir û ketim buroyê, berî her tiştî, min çavên wê dît. Ew çavên ko mîna çavên xezalan dibiriqîn, yê Cananê bûn. Bêyî Cananê kesekî din ne xwediyê çavên welê bû. »Canan« min got, »Canan, Canan!..« Wê jî bi tenê gote »Ceco!..« û giriya. Min ew hilgirt û bir mala Kamuran. Kamuran çbû û li Parîsê, zanîngeha Sorbonê bûbû mamostayê ziman û edebiyata kurdî, lê mala wî ya Bêrûdê, bi xêra pereyên ko wî dişandin, hê li ber d estê me bû. Carina, gava zarokan nefesli min diçikand, ez diçim û li wir dimam. Carina jî heval û dost li wir diman. Min Canan bir wir.

Canan hatibû. Heçî dûr bû, bi nûr bû. Yanî îcar jî wê dixwest ko me dilên

xwe yê şikestî bida nik hev. Lê dil şikestî bû, cebara wî zor bû, umir kal bûbû, geşkirina wî zehmet bû, beden pîr bûbû, kel jê ranedibû. Celadet Beg radibe ser piyan, dere aliyê gramofonê, rûyê plakê diguherîne, wê dîsan datîne ser û vedigere cîhê xwe. Dewama senfoniye, bi hêdîka, dest pê dike. Celadet Beg cixareyek ji pakête derdixe û vêdixe. Ew jê çend nefesan dikişîne û li Cananê dinihêre; ew keça ko dilê wî yê

xort, li Stembolê, bi firê xistibû, ev bû. Wê dilê xort ji tirsê evîn û bedenê germ rizgar kiribû, di dilê xwe de stariyekê dabûyê, 9 99evên tarî quli-

pandibûn ser bihuştên ronî, find û çira vêxistibûn, di bin ronahiya wan de, bedena xwe ya ciwan vekiribû, agir bi dilê xort xistibû, jê çirûsk fi-

randibû, bi bêdengî, bi keneke zarîf, çav ramûsîbûn, lêv gez kiribûn...

Belê ev bû, Canan bû ko bi hêdîka lehîf ji ser xwe davêt, bedena xwe ya

tazî, bi comerdî, nîşan dida û dest dikiş, »were, Ceco, were...« Ev bû ko

262

bi hêdîka ji nivînan derdiket, çarşef li xwe digerland, diç ber pencerê û

porê xwe yê dirêj ber bi paş davêt, dizîvirî û bi ûsil dikeniya. Belê, ev bû ko piştî şevên dirêj ên ronî û bêxew, bi hêdîka, serê xwe datanî ser sînga

bi pirç û mîna xezaleke biçûk, di xew re diçû. Ev bû ko gava dil germ dibû, lehî lê radibû, ji binî, çavê xwe vedikir, bi daxwaz, bi coş, li çavan

dinihêrî û digot, »Ceco, ax, Ceco, toujours...« Ev bû, belê, ev jina hanê ko

niha kilên çavan, tevî hêstirên çavan ji rû û hinarikê wê ber bi jêr dibin,

bû ku, bêdeng, bêyî ko bipeyive, xewn dineqîşandin, jîn bi rengên keske- sorê, dihûnand û xeyal direngandin... Belê, belê, ev bû ko wî jê hez dikiş,

bi hemû dil û canê xwe, bi hemû coş û kela xwe...

– Herkes te meraq dike, Canan, hinekî sakîn, dibêje. Herkes bi hêvî bû

ko tu dê, rojekê, vegeriyayî.

– Ez jî bi hêvî bûm, Celadet Beg herdu destên xwe vedike û bi keneke

xemgir, dibêje.

– Herkes li te û halê te dipirse. Herkes te, Celadet Alî Bedirxan, pir

meraq dike...

– Kîjan Celadet Alî Bedirxan, Celadet Beg, dîsan, bi ken, dibêje, kîjan ji wan? Yê Kadikoy û Stembolê ko di nav ziman û çand ên têkel de hatiye

dinê û perwerde bûye û dilê xwe daye ber agirê dilê keçeke boşnak? Neviyê Mîr Bedirxan û lawê Emîn Alî Beg ko mîna bav û kalê xwe jînxwe bi ruhê kurdîtî û selametiya kurdaniyê neqîşandiye û loma jî, mîna

wan, dilşikestî, berê xwe daye gorê? Celadetê Alemanyaya û Awrûpayê ko

prins bû, ruhê xwe bi îlmê fransizî û alemanî perwerde dikir û Bîsmark,

Goethe, Nietzsche dixwend, lê rojên xwe bi du serî kartol derbas dikirin?

Yê Lubnan û Sûriyê ko di nav hêlekana dijwarî, nediyarî û bêgaviyên Rohilatê de, hê jî, dere û tê? Kalê ko tu îro dibînî û rîh, simbêl û por spî kiriye û bûye bavê Sînem û Cemşîd e? Kîjan, Canana delal, kîjan Celadet

4

Alî Bedirxan dipirsin? Kîjan?

– Kîjan? Bibêje kurê min, tu kîjanê dixwazî? – Bavo, ez wî apê ermenî dixwazim, ew pir xweş lêdixe, bavo.

– Baş e, kurê min, ez ê wê ji bo te bikirim. Ew li Bêrûdê heye. – Wî apoyî bi awaza stranên kurdî lêxistiye, ne welê bavo?

– Herê kurê min, wî dengê bilûra kurdî kiriye musîkeke yekta.

– Bavo... ez bibêjim? Ez tiştêkî din jî dixwazim...

– Bibêje kurê min, bibêje...

263

– Ma quweta me heye? – Herê kurê min, quweta me heye tu bibêje, tu çî dixwazî ji bavê xwe re bibêje, metirse û şerm meke.

– Bavo, li dibistanê... tu zanî, li dibistanê hevalên min hene. Ereb,

kurd, ermen û sur yan... Bisiklêtên wan hene. Bavo ew bi bisiklêtan tîn dibistanê.

– Tu bisiklêt dixwazî, kurê min? Bibêje, tu wê dixwazî?

– Bavo, tu zanî, Abîd û şêrko hene. Te dît, ew tîn mala me jî. Bavo, bisiklêtên wan pir xweş in. Bisiklêta Abîd belek e û dibiriqe. Xelekên rengên bisiklêta wî dikevin nava hev. Gava ew lê siwar dibe û dere malê

yan jî pê tê dibistanê, bisiklêt dibiriqe. Bavo ew çanta xwe jî datîne pişta

bisiklêtê...

– Bavê te dê yekî welê ji te re bikire. Tu meraq meke. Bi xêr, tu ji vir derkeve, ez ê bisiklêtek ji ya Abîd jî xweştir ji kurê xwe re bikirim.

– Ma quweta me heye? Ma tu dikarî bikirî? – Herê kurê min, ez dikarim, çima nikarim... ez ê bisiklêtekê ko dibiriqe, bikirim...

– Bavo, ez tişteki din jî bêjim?

– Bêje kurê min, bibêje... – Bavo, Sînem şerm dike bibêje... çanta wê kevn bûye, çavikên çantê

çriyane... li bazara Mercê, wê û Huseymayê li dûkanekê çanteyên rind

ên çerm dîtine...

– Ez ê bi Sînem û Huseymayê re bipeyivim, kurê min.

Niha, tu, bi hêsanî, gotinên wê rojê vediguhezî ser kaxizên spî û dinivîsî. Pênûs bi hesanî wan li hev tîne. Lê tu were û ji min bipirse ka min hingê çidikişand û çi hîs dikir... Cemşîd, lawê min ê yekane, zuriyeta min, newêrîbû daxwaza d ilê xwe yê zarok bigota! Wî behsa qu weta me d iker û nikarîbû behsa daxwaza xwe ya bisiklêtekê bikira! Tu dê bav bî, di ser de mîr b î û lawê te dê, ji ber rewşa kambax û teres, ji neçariyê, ji te tişteki nexwaze! Tu dê nikaribî jê re bisiklêtekê bikirî... Ma mirin jê ne çtir bû?

Eger Cemşîd ne li nexweşxanê bûya, ez ne bawer im ko wî dê behsa bisiklêtê jî bikira. Cemşîd li nexweşxanê bû, bedena wî ya bişk bi taya nex weşkiyeke xedar ketibû. Me ew biribû nexweşxana fransizî

ko min ê jî paşê, piştî hilweşîna bîrê, ziyaret bikira. Cemşîd diviya li nexweşxanê bima û tedawî bûya. Lê quweta me nîn bû ko me bikaribûya mesrefên nex weşxanê bida! Me nikarîbî dermanên pêwîst bikirîna! Lê bi hêviya ko

264

min ê, dîsan, ji dostekî xwe deyn bikira û mesref bidana, me Cemşîd li

nexweşxanê razand. Ez her roj, piştî nîvroyan diçûm nik wî û li ber serê wî

rûdiniştim û pê re dipeyivîm. Diviya tişteki bi Cemşîd nebûya, piştî herdu Safteran, min nema dikaribû xwe rabigirta. Cemşîd ko hê zarokê dergûşê bû, bi avejeniyê hîn bû, pêncsalî bû li hespan siwar bû, heştalî bû, bi min

re hate seyde, diviya bijiya û li ser riya bav û kalên xwe bimeşiya, navê me

bidomanda...

Lê rewş ne tu rewş bû, teres û kambax bû. Ez nikaribûm biniviyama, xew

nediket çavên min. Ev gotina hanê ya kalemêran ko min tu carî bawer nedikir ko ew ê ewçend bibûya rastiya jîna min, mixabin, bûbû rastiya min; xewa miriyan tê, xewa birçiyên nayê. Rast e, berê jî, ez gelekî birç mabûm, min gelek rojên birç derbas kiribûn. Lê hingê ez bi tenê bûm. Nanê tisî, du serî kartol, p ariyeke penêr têra min dikir. Niha zarok hebûn, barê malê hebû, navê mezin hebû, hatin û çûyina boş hebû. Loma çaxa ez diketim nava ciyan, hemû dijarî, zehmetî û bêgavî li dora min dicivîyan. Bêare, ez dîsan ji nav nivînan derdiketim, min cixareyek vêdixist, li Rûşena ko çavê xwe vekiribû û bêdeng li min dinihêrî, mêze dikir û diçm oda xebatê. Tu dê bipirsî ka min li wir çi dikir? Hî. Ji vexwarina araq, kişan- dina cixarê û guman û pojandinê pê ve, hî tişteki. Pênûs nedilivîya, goti- nan koç kiribûn. Dinya bûbû tarî, tu çilka ronahiyê ji derekî nedixuya. Ne pêtek ne jî çirûskeke hêviyê...



û di ser de jî jîna rojane, keft û leftên wê, dijwarî û mesrefên wê.  
Mesref

pir bû, lê hatin nîn bû. Nav, şan û şoret mezin bû, lê dirav û dewlemendî tune bû. Ez çawan bib êjim, çawan bi te bidim fahmk irin? Mesela Canan û hatina wê. Canan, bi xewnên xweş, xeyalên mezin, hatibû û bi qasî sê hef- tan li Bêrûdê mabû. Lê piştî ko wê jî fahm kiribû ko êdî dereng bû, êdî pay- izê bi ser umir û bedenê de girtibû, ew, bi girî, çavên wê li min, li keştiya fransizî siwar bûb û b erê xwe dabû Marsîlyayê. Ew hatibû, agirê dilê minê ko vemirîbû, ji nû ve, vexistibû û çbû.

Heye ko gotin ne di cîh de be, lê mesrefên me yên sê heftan bi qasî hati-

na şeş mehên Rûşenê bûn. Xwedê şahîd e, min tişteke ji yara xwe ya rojên bajarê min ê abadîn Stemb olê teksîr nekiribû. Lê her tişt bi deyn bû û roj bi roj, deyn zêde dibûn. Rû şena reben gelekî xwe diêşand da ko alîkarî bike. Wê mamostahî dikir, li zarokan dinihêrî, zarok û Huseyma didan xwendin û hemû karên me dimeşandin. Min jî dixwest, pir dixwest koalîkarî bikira. Lê ji destê min zêde tişteke nedihat. Mixabin ez bi kêrî şixulên tîcarî û diravî nedihatim. Kamuranê me, ji min jîrtir bû. Wî hem şixulê xwe

265

yê ziman û edebiyatê dimeşand hem jî yê tîcaret û aboriyê. Min nikarîbû, ez bi tenê bi kêrî gotinên birîndar ê kurdî dihatim. Lê wan jî pere nedikir, mîna ko Xanî, şaîrê mezin ê kurdan, mamosteyê evîndariya welêt ê bav û kalên min, gotibû, bazara wan kesat bû. Ez ji malbata ezîzan, mîre kên Cizîra Botan bûm. Karbidestên dewletên Rohilatê nas û dostên me bûn.

Giregir mêvanên me bûn. Keça kekê min Sureya bi birayê Qiralê Urdinê re

zewicîbû û bûbû bûka Sara yê. Damat Ehmed Namî Be g ko reîsê cumhurê Sûriyê bû, nas û xizmê Bedirxaniyan bû. Mala qiral Evdillah dostê malbatê bû. Serekwezîrê Sûriyê Husnî Zaîm dostê mala me bû. Di wextên

Osmaniyan de, gava mamên min Bedrî Paşa, Xelîl Ramî Beg, Elî şamîl Paşa

û yên din li Rohilatê karên dewletê digerandin, wan gelekî çê yî bi van mal û malbatên ko niha Rohilat îdare dikirin, kiribûn. Lê tu carî, min rûyê xweber bi wan nedikir... Min nedixwest ko ez Lala Paşa bûma, birçbûn ji Lala Paşatiyê çtir bû.

Heçî ew ap ê ermenî ko Cemşîd, bi zimanê xwe yê şêrîn, behs dikir, Aramê Xaçaturyan, musîkjenê mezin ê Ermenistanê, bû. Min du plakên wî yên kevirîn ji dostên xwe yên ermen ên Bêrûdê deyn kiribûn û anîbûnşamê û li wan guhdarî kiribûn. Li malê gramo foneke baş ko Rûşenê, ji bo Huseyma û Sînemê kirîbû, hebû. Bi qasî du heftan, plakên yekta yên Xaçaturyan her li ser bûn. Navê plakan »Gayaneh« bû. Gayaneh keçikeke ermen bû, navê birayê wê Ermen bû ko ji keça kurd Eyşê hez dikir... Plakên ko pir xweş li hev hatibûn û li ser musîka kevnare ya ermen û kurdan lê bûbûn, du heftan mala me şên kirib ûn. Li nexweşxanê, oda spî ya si- waxkirî, Cemşîdê ko rojên berşîriyê heta rojên nexweşxanê, her û her, li dengê bilûra Ehmedê Ferman guhdarî kiribû, ew plak dixwestin. Xû yê şîrê heta pîrê bû!..

– Bavo, ez tiştêkî bibêjim?

– Bibêje berxê min. – Perên Axa Delalê min, Kalo Ehmed pir in. Ew wan pereyên ko tu û

mêvanên ko tên malê, didinê, vedişêre. Wê şeva hanê, bavo, gava ew

apoyên fransîz hatibûn û Axayê Delal ji wan re li bilûrê xistibû... ew şev

tê bîra te, bavo?

– Herê, kurê min, tê bîra min... – Wê şevê, bavo... tê bîra te, te pere dan wî. Wî ew pere wergirtin û

birin veşartin... Ew perên x we dixê nav doxîna xwe. Zêrên wî jî hene, ba-

vo.

266

– Kurê min, ew heqê wî ne... – Lê bavo, ew peran winda jî dike... – çawan, kurê min?

– Gava ew dere avdestxanê û doxîna xwe vedike, pere jê dikevin û ji qu-

likê derin. Bavo, gerek e, ew perên xwe bide te.

– aima kurê min, çima ew ê bide min?

– Ew wan ji bîr dike û paşê dixîne, winda dike... û Axayê Delal dibêje  
5

ko quweta te nîn e, destê te teng e. Gerek e, ew wan bide te...

Zînê, Zînê, gerek e, tu bidî min...

Bi vê gotina Muslîm Axa, hemû meclisa Husên Axayê îbîş dikene. Bi qasî kêliyeke dirêj, herkes, bi dengê bilind, dikene. Bi

tenê Celadet Beg nakene. Ew cixara xwe dikişîne û li wan dinihêre.

– Naxwe, we fahm kir ko ez ê çîroka Xelîl Axa û qerwaşa wî bêjim, Muslîm Axa dibêje û dîsan dikene.

Civat jî pê re. Di vê şeva çixsayî de, meclîsa Husênê îbîş hem şên e, hem

jî germ. Bi qasî deh kesan, kurdên şamê û çendên aliyê Cizîrê ko bi mê-

vandarî hatine şamê, ji bo şevbihurkê, civiyane. Dûmana soba ko li ber devê derî ye û dûmana cixarê dikeve nava hev. Derî û

pencere girtîne, hawa odê gelekî giran e. Celadet Begê ko hînî hawa paqij bûye û sal

donzdeh meh pencerên malê vedike, ji hawa odê eciz dibe. Lê ew dengê

xwe nake, çaya ko jê re hatiye, vedixwe û mîna yên din, cixarê dikişîne. Ode sade ye. Li erdê mehfûrin û xalîçeyeke basîd raxistî

ye. Li ser

mehfûran jî doşek. Mêvan li ser doşekan rûniştine. Husên Axayê îbîş ne

li odê ye. Ew heta dereke çûye

– Mîrê min, eger te îzin hebe, ez ê ji cemetê re çîroka Xelîl Axa bêjim,

Muslîm Axa ji Celadet Beg dipirse.

– Rîca dikim, Muslîm Axa, Celadet Beg, bi hêdîka dibêje. Fermo... Muslîm Axa li civata odê dinihêre, simbêlên xwe ba dide, dikene,

»Hûn dizanin, Xelîl Axa heye« dibêje û dest bi çroka xwe dike,

– Hûn dizanin, Xelîl Axa elimiye ko xizmetkara wî, Xaltiya Zînê, her dem aliyê wî bike û bi misînê dest û lingên wî bişo...

Muslîm Axa ko xwediye çend jinan û çend gundên aliyê aiyayê Kurmênc e, li vir, radiweste û dîsan li Celadet Beg dinihêre. Bala Celadet Beg ne li ser Muslîm Axa ye, ew li sobe û dûmanên ko jê radibe, dinihêre.

– Mîrê min, li qisûrê menêre, Muslîm Axa dibêje, dîsan dikene û çroka xwe didomîne, belê, Xaltiya Zînê aliyê Xelîl Axa dike. Rojekê... Xelîl

267

Axa... ewê xwe... yanî qamîşê xwe rep dike... û banî Zînê dike, dibêje,

»Zînê, de were, aliyê min.« Dema Zînê dere ba wî, ew ewê xwe... yanî ewê xwe yê rep derdixe û dibêje, »Zînê, de were, carekê jî vî rebenê ha bişo... ma tu vî jî carekê bişoyî, kevir ê bibare!«

aîrok xelas dibe. Muslîm Axa dikene, gava ew dikene, hemû bedena wî

ya girs diheje. Yê din jî dikenin. Welê dixuye ko kêfa wan gelek î jî çîrokê

re hatiye. Ew, bi deng, dikenin.

Celadet Beg, bi tenê, cixare dikişîne û li Muslîm Axa, rûyê wî yê fireh,

kenê wî yê bêperwa dinihêre, carekê li Muslîm Axa, carekê jî li yê din

dinihêre. Bi hênceta çi vî axayî ev çrok got? aima? Ev ên din çima evçend dikenin? aima ev çrok evçend xweş û balkêş bû? Celadet Beg hê weha d ifikire, yekî din ê kal, bejndirêj, jar û rîhdirêj ko Celadet Beg berê

hiç nedîtiye, dest bi axaftinê dike.

– Eger Mîrê me rê bide, ez ê çîrokekê bibêjim, ew dibêje, lê ya min ne

mîna ya Muslîm Axa bê edeb e.

Bêyî ko ew li bersiva Celadet Beg bipê, ew dest bi çîroka xwe dike û dibêje,

– Rojekê Hezretî Miheme Eleyselam ji Cebraîl dipirse, dibêje, »Ya Cebraîl eleyselam, tu ayetan ji min re tînî. Baş e, kî wan dişîne? Kî ye?«

Cebraîl dibêje, »Ez nizamim. Ez derim qata Xwedê, li wir ayetan werdi- girim û tîm. Kesê ko ayetan dide, li paş perdekê ye. Ez wî nabînim.« Hezretî Miheme ji Cebraîl dixwaze ko ew careke din li paş perdê bimeyzîne, ka kî ye ayetan dişîne. Cebraîl wekî Hezretî Miheme dike, dere û perdê vedike. Lê çî bibîne? Hezretî Miheme bi xwe ye, li wir rûniştiye. Ew poşmam dibe, vedigere, tê ba Hezretî Miheme. Miheme

Eleyselam bi meraq jê dipirse ka kî ye li paş perdê rûniştiye. Cebraîl dibêje, »Ya Miheme, kesê paş perdê û pêş perdê jî eynî ye, yanî tu hem li vir î

û hem jî li wir î...«

Civat dîsan dikene. Dîsan, ji Celadet Beg pê ve, hemû bi hev re dikenin.

– Seyda te ev çrok bi hênceta çî got? Celadet Beg ji kalê rîspî dipirse. Bibore, ez baş tenegehîştîm.

– Min ew bi qesta mele û şêxên me got, mîrê min, xwediyê çîrokê dibê-

1. Tu dizanî, mele û şêxên me...

Wî hê gotina xwe xelas nekiriye, Husên Axayê îbîş dikeve hundir.

Civat radibe ser piyan. Husên Axa silav li wan dike û tê nîk Celadet Beg

û destê xwe didiyê.

268

– Mîrê min, min efû bike, haya min ji hatina te nebû, ew bi ken dibê-

1. Zariyan xeber bi min gihandin, ez bi lez hatim. Fermo, em rûnin.

– Na, gelek spas, eger te hinekî wext hebe, min dil hebû, em hinekî bipeyiviyana, Celadet Beg, li pê, dibêje.

– Fermo, Husên Axa dibêje û bi destan rê nîşanî Celadet Beg dike. Celadet Beg ji civatê xatir dixwaze, pêlavên xwe yên ko li ber derî ne, dixwe lingên xwe, Husên Axa jî yên xwe, dîsan, dixwe lingên xwe û herdu bi hev re, ji odê derdikevin.

Di wan rojan de ko tu niha behs dikî, ez bi dût ketibûm; ji xwe, ji hebûna xwe, ji welatê xwe, ji dem û wextên xwe yên zaroktî û xortiyê yên Stembo lê, ji bîr û hîs, ji nas û dost, ji xwendin û nivîsîn, ji gotin û qiseyên birîndar dût bûbûm. Ez dût ketî û derketî bûm. Her tişt di nav bêdengiyê kûr de xerîbî min bû. Ez, xerîbê welatên xerîb, bûbûm xerîbê her tiştî.

Neçarî û bêgaviyê nefes li min çikandibû, ez ji her tiştî bi dût xistibûm. Bi tenê seyd û nêçîr mabû. Bi tenê nêçîr û seydê ez ji derd û keseran, neçarî û bêgaviyan bi dût dixistim. Dostên min Roger Lescot, Husên Axayê îbîş û çend fransizên di ko ji nêr û seydê hez dikirin, bûbûn hevalên min ên revê. (Belê, nêçîr û seyd rev bû.) Seyd û nêçîrê ew valahiya boş a Hawar û Ronahî-yê dagirtibû... Hema çi bigire her hefte, em diçûn seydê. Tu kê- maniyên kinç, taxim û tiffinên min ên nêrê nîn bûn. Kinç û taximan Kamuran ji Parîsê şandibûn, tiffin jî ya Hesên Axayê Haco bû. Gava berbanga sibê, berî ko ro hilhatibe, hevalên min, bi jîpê, dihatin, ez hazir bûm. Di êvarê de, min berik hazir kiribûn û berî ko ew werin, min kincên xwe yên boz li xwe kiribûn û rext girêdabûn. û bi hatina wan, em bi rê diketin. Gerç ne şengê û ne jî Belênê mabûn. Şengê li kuç di bin ere- beyekê de mabû û me jê re, bi hêstirên Sînem û Cemşîd, şîneke nedîtî li dar xistibû. Belêna ko êdî pîr bûbû jî çûbû gundê xwe. Piştî ko min kew azad kirin, min Belênê jî şand gund. Jixwe seg û tajiyan min ên wefakar nebûna jî dibû, ji ber ko êdî jîp hebûn, bi jîpên Mr.

Lescot û Husên Axayê îbîş, em diketin p ey nêrên xwe. Em diç nêra xezal û betan ko di her derên Sûriyê de hebûn. Li Cizîrê, Serê Kaniyê, navbera Dêr û Hesiçê, li do- raliyên Tidmûr û Risafê, li Nasriyre û Cêrûdê... Xezal kerî bi kerî digeriyan. Carina karên wan rastî me dihatin, carina jî nêrî. Carina jî kewroşk. Di berbangên sibehan û hingûrên êvaran de, xezalan xwe li zeviyên garisan digirtin. Gelek caran bi xezalan re bet jî dihatin d îtin.

Ji sibê heta êvarê, em li pey wan bûn. Min bîr û heşê xwe didayê, ji sibê

269

heta êvarê, heşê min li ser wan bû, -da ko heşê min ji jîna min bi dûr ke- ta. Lê rastiye hertim zora xewnê dibir. Derengê êvaran, ez, tevî xezal û betên kuştî, vedigeriyam malê. Zarok li dora min diciviyan, wan û Rûşenê heywanên ko min anîbûn, dibirin mitbaxê. Sînemê dilezand û diçû plaka tirkî »Her Yer Karaniyê« datanî ser gramofonê. Wê dizanîbû ko min gelekî ji şîra wê stranê hez dikir. (Lê wê nizanîbû ko stran qulipîbû ser qedera min û wê hîsên min jî vedigotin...) Cemşîd jî textê setrencê danî da ko min pê re bilîsta.

Wê şeva ko ez çûm mala Husên Axayê îbîş, dîsan, ez ji seyd û nêçîrê hatibûm. îcar ez dest vala bûm. Me bi tenê karikek, sax girtibû û ew jî dabû Lezgîn Axa, yanî Mr. Lescot da ko ew wê diyarî xanima xwe Florensê bike. Wê ş evê, piştî ko Sînemê plak danî serê, ew hate nik min û li erdê rûnişt. Wê dil dikir tişteke bigota. Min ew pê da gotin; wê cil û bergên nû diviyan... Tabilê min xwe da hev û bi kincên seydê, ez derketim, tevî ko şev êdî dereng bû, çûm mala Husênê îbîş. Li wir jî, her mîna ko tu behs dikî, ew şêx û axayên me rûniştibûn û çîrokên xwe ji hev re digotin! îş û karê wan her- tim çrok bû. Bîr û heşê wan her li ser çrokan bû. Xwendin, nivîsîn, afirîn, avakirin, eser, medeniyet... ev tişt dûrî wan bû. Şeb û şekir li nik wan yek bû. Bi pîqepîq, ew dikeniyên û mîna her carê, şevbihurka xwe li dar dix- istin. Wexta leglegê diç bi leqleqê... Eger yekî ko ew nas nekirina, li wir bûya, wî dê bawer bikira ko dostî û samîmiyeta wan kesên rûniştî bêpayan bû. Lê min dizanîbû ko ne

welê bû. Ew bi hev re dikenyan û çrokên mele û şêxan digotin. Lê li pey hev jî dijminê hev bûn û hezar û yek tiştî li dijî hev digotin. Herweha li dijî min jî... 24 -25 salên min ên Rohilatê hînî min kiribû; kurd ne yek bûn, yekîtiya wan pir dijwar bû û wan gora hevûdu dikolan. Dinya dijminê wan bû, ew jî dijminê hev bûn. Her cara ko min civatên wandidîtin, gotinên Ovidius, mamosteyê rojên min ê Stembolê, dihatin bîra min; mirov gurê hev in... Lê kurd ne bi tenê gurê hev, ew ruhistîne hev bûn jî. Dinyayê nefes li wan çikandibû, wan jî, bi dijîtî, berberî, hesûdî, dexesî, teşqele û xirecirên biçk û pûç, her roj, her saet, her deqe, nefes li hev diçikandin. Dinya yê rê li wan girtibû, wan jî li hev... û li min... li min... Hingêli parlamentoya Sûriyê şanzdeh wekîlên kurdan hebûn. Min hemû di- nasîn, hemû dihatin û diçû mala me. Lê me fikir nedikir, me nikarîbû ew bianiyana nik hev da ko wan ji bo gelê xwe yê reben û bêmaf tiştin çê biki- rana. Ew nedihatî nik hev, -ji ber ko ew li dijî hev bûn, na ne li dijî hev, di- jminê hev bûn. Ew diçûn û bi dijminên ziman û çanda kurdî re dibûn yek, lê ne bi yê xwe re!.. Dev jê berde, em gotinê zêde nekin. Tu vegere ser ro-

270

manê, ser bîrê, bîra qedere...

– Mîrê min, fermo, emrekî te? Husên Axa, li ber derî, ji Celadet Beg, bi meraq dipirse. Xizmetek ko ez bikaribim pê rabim?

– Husên Beg, ew zeviyên te yê gund... Celadet Beg ji pakêta cixarê cixareyek derdixe, wê vêdixe û bêyî ko li Husênê îbîş binihêre, dip eyive.

Tê bîra te, te behsa wan zeviyên kiribû...

– Belê, tê bîra min. – Gelo ew ji bo pembû nabin? Niha herkes behsa pembû dike herkes pembû diçîne... Mirov nikare li wir pembû biçîne?

– Belê, çima na. Erd gelekî rind e. Lê av divê... – Ma mirov nikare bîrekê bikole û jê av derxe? – Belê, çima na... Av pir e, meriv dikare avê derxe.



– Husên Beg, min biryara xwe daye, ez divê dest bi şixulekî bikim ko hinekî pere bîne, hinekî halê me çêtir bike. Eger bi dilê te be jî, mi dil heye, em pembû biçnin...

– Mîrê min, siheta te xweş. Ne hewce ye ko em gotinê rakin û daynin.

Ji niha pê ve, ew zevî yên te ne...

– Husên Beg, em ê pembû biçnin, em ê bîreke yekta bikolin, jê aveke

6

boş derxin û em ê pembûyeke baş rakin...

– Me pembû çandiye, bîrek kolaye û em bi hêvî ne ko em ê jê aveke boş derxin û pembûyeke baş rakin... Xweha min a delal, halê me dê baş be, halê te jî, yê me hemûyan...

Meziyet hatiye.

Xewna bîst û çar salan bi cîh bûye. Piştî wexteke dirêj, gelekî dirêj, ew gîhane hev. 24 sal, salên dirêj, dijwar û kambax. Salên bi bêrî û tijî hesret. Meziyet, Mezoya malbata Bedirxaniyan, tevî mêrê xwe, hatiye şamê, serdana kekê xwe.

– Celadet Abi, Huseyma û Sînemê ez îro li bajêr gerandim, Meziyet destê xwe davêje porê Sînema ko li kêleka wê rûniştîye û dibêje. Em çûn ser tirba Selehedînê Eyûbî. Sînemê her tiştî, bi kitekit, bi min da zanîn. Êvar e, ew li ser şîvê rûniştine. Xwarinên ko ji bo wê êvarê çêbûne, yên Cizîra Botanê, yên Amojna Stî ne. Rûşen Xanim û Meziyet, bi hostehî, ew çkirine. Bîhnên cihê yên rojên kevn ji xwarinan difûrin.

– Abî, ev xwarin divê bêtin bîra te. Amojna Stî û Dadê ew çdikirin. Tê bîra te? Gava mam û metên me mitbaxa me ya mezin tijî dikirin û bi qise û kenên xwe mitbax geş dikirin, eynî ev bîhn bûn ko ji mitbaxê difûrîn. Tê bîra te?

271

– çawan nayê bîr a min? Lê tu qet behsa dayê nakî...

– Bavo tu zanî me çi kirîn, Sînem dibêje û gotina bav û meta xwe dibire. Tu dê ji wan gelekî hez bikî, ez dizanim.

– We çî kirîne, keça min? – Me plaka Aida kirî... Metê wê pir xweş dibêje... û me plakeke din jî kirî...

Celadet Beg bi ken li keça xwe dinihêre û li hêviya bersiva wê dimîne.

Lê Sînem bi tenê dikene û li meta xwe dinihêre. Met jî dikene.

– De ka tu nabêjî? Celadet Beg ji qedeha xwe ya araqê çend qult vedixwe û dipirse.

Sînem serê xwe dihejîne. Wê dil nîn e ko bersiv bide. çavên wê li ser meta wê, ew dibêje, »yek, dido û sisêê... « û ew û Meziyet, bi hev re, dest bi stranekê dikin; Je t-entend toujours, son tour, toujours...

Belê, »Je t-entend toujours, son tour, to ujour...« Strana mala me ya Kiziyî Itoprakê, strana ko her rêzeke wê, bi dengê Mezo, dibû yakûd û lûlû.

Strana danên êvarên bexç mala me ya duqatî. Mezo û Sefo ew digotin. Me jî, min, bavo, dayê û birayên min din ên, bi ken, li wan guhdarî dikir. Lê kê dizanîbû ko keça min jî dê piştî 40-45 salan, li şamê ew bigota!..

Yek ji wan stranên pêşîn ko Sînem hîn bû, ew strana fransizî bû. Hê zimanê wê baş nedigeriya, wê dest bi vê stranê kiribû. Ji bo wan salên min ên Stembolê û xweha min a zimanşêrîn, min ew hînî Sînemê kiribû... û ni- ha jî Mezo û Sinemê, bi hev re, ew digotin. çavên min ên westiya yî ji kêfan dibiriqîn.

Mezo hatibû. Dinya bûbû ya min, ez dîsan vegeyabûm dinyayê. Mezo rojên min ên zaroktiyê anîbûn, Stembol anîbû, tahm û bîhnên ko min ewçend bêrî kiribûn, anîbûn. Mezo, xweha min a esmer û çavre ş, xweşso- hbet û samîmî, stêrk û şevên ronî, tav û tîrêjên germ li payiza umirê min vegeyandibûn.

Gava ew hate, ez ne li malê bûm. Min xwe dabû karê xwe, çandina pembû. Ez hertim li gund, li ser zeviyên bûm. Me bîreke mezin, li kêleka zeviyên, dikola. Rojekê, gava ez ji gund vegeyayim, Rûşenê gote min, »Celadet Abî, Meziyet hatiye...« Pêşî ez tenegehîştim ka wê çî digot, paşê hêdî hêdî ez tenegehîştim. Min li dora xwe nihêrî.

»Ka, ew li kû ye«, min gotê. Ew hê nehatibû şamê, li Bêrûdê bû. Wê telefonî malê kiribû û bi Rûşenê re

272

peyvîbû. Wê û Rûşenê hevûdu nas nedikirin, hevûdu nedîtibûn. Rûşenê, bi carekê, xwe dabû hev û bi rê ketibû, çûbû û ew li Bêrûdê dîtibû. Paşê jî ew dîsan vegeyriyabû. Bi rojan, ez li gund dimam. Gava e z vegeyriyam û Rûşenê xebera hatina Mezo da min û got ko ew hê li Bêrûdê ye, ez gelekî eciz bûm. aima wê ew neanîbû? Paşê mi fahm kir, çima. Ez kal bûbûm, es- ebiyetê ez xistibûm. Nemaze piştî şikesta Komara Mahabadê ya kurdî, xewa şevan li min heram bûbû. û çaxa bi qasî kêliyekê xew biketa çavê min jî, ez ji xewê vediciniqîm û hişyar dibûm. Eger min xweha xwe, ji nişkekêve, li hember xwe bidîta, heye ko tiştêkî bi min biqewimiya. Rûşen û Mezo weha fikirîb ûn.

Ma hewce ye ko ez hîsên xwe yên dîtina piştî bîst û çar salan, niha, bibêjim? Wê, bi girîn, xwe avêt hembêza min. Ew li min piçikiya û rû, rîh, gum, çav û eniya min ramûsî. Ne ji min, ne ji wê deng derd iket. Ew di- giriya... Ji çavên min jî çend hêstir gêr bûn... Paşê, hêdî hêdî, em dîsan hînê hev bûn. Mezo, dîsan, eynî Mezo bû; şên, bi henek, zimanxweş, dengbe- dew û bihîstiyar. Lê neçarî li dora wê bû jî. Jînê li wê jî xayintî kiribû. Dengê wê, xwendin û perwerdeyîya wê nema bi kêrî tiştêkî dihat. Wê li Stembolê atolyeke terzîtiyê vekiribû û cil û bergên jinan didirû. Xweha min a bîrbir ji Rûşen, Huseyma û Sînemê re jî kinc dabûn dirû n û anîbûn.

Li pey kena wê ya hertim endîşeyeke diyar hebû. Qermîçokan li ser rûyê wê jî rê vekiribûn. Herçiqas ne mîna min porspî bûya jî, tayên spî porê wê jî vegirtibûn. Xweha min a ko mîna şitilan bû, gelekî qelew û fireh bûbû, rûyê wê gilovertir bûbû, di b in çavên wê de kîsikên biçûk hatibûn pê... Jîn bêşop derbas nedibû. Tevî vê, tevî ew qeda û belayên ko bi serê me de hatibûn, em hê jî mêvanê jînê bûn!.. Mezo jî, mîna min, ji araqê hez dikir. Gava Rûşen, zarok û mîrê wê ko yekî nenas bû, diçn û radizan, min û wê dest bi sohbeta xwe dikir. Min dipirsî, wê digot. Mam û met, nas û xizm, kes û şexs,

cîh û war, reng û tahm, mal û tax, cade û kolan, deng û pejn, yek bi yek, dihatin û dibûn mêvanên sohbetên me. aaxa serê me hinekî xweş dibû, wê ji min dipirsî, »Abî, ez wan stranên ko te jê hez dikirin, bibêjim?..«Min ê çawan bigota na... Wê dest bi stranên mala me ya zaroktiyê dikir, em herdu bi hev re, difiriyan û diçûn Stembolê, mala me ya bi bexçe û bîr.

Lê wê bi tenê behsa Dayê nedikir. Her cara ko qala Dayê dibû, wê gotin diguherî. Min rewşê fahm kiribû, lê min xwe li nezaniyê datanî. Lê heta kengê?

– Mezo, sevgili kizkardeşim, xweha min a delal, Celadet Beg ji teyfika ber

273

xwe, tîkeyekî goştê biraştî yê xezalan, jêdike, dibe devê xwe û bi ken dipeyive, xweha min, mixabin, em hew zarok in... Tu ji kekê xwe re bibêje... Dayê... çawan wê wefat kir?

Bêdengiyek bi ser sifrê de tê. Kes napeyive. Celadet Beg bi gotina xwe poşmam dibe. Lê tîrê ji kevanê firiyayî hew vedigere. Ew qedeha xwe dibe devê xwe û li xwişka xwe dinihêre. Meziyet li birayê xwe dinihêre, li çavên wî, li bîbikan dinihere.

– Destpêka salên sîhan bû, ew çavên xwe ji kekê xwe direvîne û dibêje.

Destpêka havînê bû. Danê êvarekê bû. Wekî her carî, wê rojê jî, dayê dol- benda xwe avêt serê xwe û derket bexç, nik bîrê û li bîrê û daran nihêrî. Piştî wefata b avo, dayê jî guherî. Ew zêde nedipeyivî. Gava ew dipeyivî jî, ne bi me re, lê bi bavo, Safter û we re dipeyivî. Wî danê êvarê jî, ew li ber

masa kêleka bîrê rûnişt û hin tişt gotin, peyivî. Min jî, di nav teyfikeke fireh de, purtaqal û mandarîn birin û danîn ser masê. Min jê re pur- taqalek û mandarînek qeşilandin. Wê ew, hêdî hêdî, xwarin, yek ji bo xwe, yek jî, ji bo bavo... tu dizanî, bavo çiqas ji purtaqal û mandarînan hez dikir... Wê hû n pirsîn, xeberên we yên dawîn pirsîn. Em hinekî li ser we peyivîn. Paşê jî wê xwest hinekî razê. Min ji hundir şûlek anî û avêt ser sînga wê û ez vegeriyam

hundir. aûyin, ew çûyin bû... Ew ket xewa kûr û nema vegeriya. Sakîn û bêdeng, eynî mîna bavo... Me ew li goristana skûdarê defn kir, nik mam û metên me. Me nexwest ko hûn pê bihesin. Jixwe derdê we têra we fikir...

Deng ji kesî dernakeve. Celadet Beg li qedeha pêşiya xwe dinihêre, bi tiliyên xwe, wê dizîvirîne. Meziyet, bêdeng, çavên xwe paqij dike. Piştî kêliyêkê, Celadet Beg, bêyî ko serê xwe rake, bi dengêkî p ir nizm, dibêje,

– aok yazik oldu... aok yazik oldu... Ew çend caran gotina xwe dubare dike.

– Anne, annem, yadê, dayê, ew, pêşî bi tirkî, paşê bi kurdî, dibêje. Reh û rêên jîna min, zarokiya min, sebaba hebûna min, kîbara min, bêdenga min, bextreşa min, dayê, dayê...

Celadet Beg hew dikare xwe rabigire, dest bi giriyê dike. Pêşî giran, pir giran, paşê bi deng... Ew digirî, serî û rûyê xwe dixwe nav herdu destên xwe û digirî...

274

FOTOGRAFA DAWÎN: Bîr; bîra qederê, bîra mirinê... heş û bîr... bîrbirina qederê... bîr, kaniya umir û jînê, warê pêşîn û dawîn...

1

Belê, rûpelên romana Bîra Qederê, hêdî hêdî, digihên dawiyê. Her destpêkekê dawiyek heye; jî fotografeke dawîn heye.

Fotograf a dawîn a çûyinê ye; çûyina dawîn a bêveger...

Fotograf a mirinê ye. Ev fotografa dawîn a romanê ko gelekî ronî ye,

tarîtiya çûyin û mirinê nîşan dide.

Sal 1951 e, ji rojan 15-ê tîrmehê ye.

Germ e, tevî ko danê êvarê ye, dinya dikele. Bajarê şamê û taxa kurdan

a bajêr, bi xebera reş, dikele; mirîna ko ji lehengê vê romanê pê ve kesî nedipa, hatiye û ber bi axa reş ,

ş ûn û warê vegera dawîn, bi rê ketiye.

aare nîn e, li hember mirinê tu çar e tune.

Di fotografê de, li pêş cenaze dixuye. Li ser milên çar kesan, cenaze bi

rê ketiye û dere. Li pey cenazê jî xelkekî pir, bi gavên giran, di kolaneke fireh de, dimeşe. Seriyê dawîn ê xelkê naxuye. Kevirên kolanê, bi şewqa tîrêjên tavê, dibiriqin. Esmen vekirî û zelal e, ne ewrek, ne jî tarîtiyek dixuye. Dinya ecêb ronî ye.

Şênî, hêdî hêdî, serê wan li ber wan, dimeşe. Ew kî ne? Kesên ko nasên

xwendevanên ne, tê de kêmin. Di navenda rêza pêşîn de, Cemşîd duxiye. Li herdu kêlekên wî jî Husnî Begê Berazî û Yusuf Melik

dixuyin. Herdu ketine milên Cemşîd û dimeşin. Bi qasî ko ji fotografê dixuye, kes napeyive.

Koça dawîn bêdeng tê pê. Bajarê rengîn ê îslamê, bêdeng, li vê çûyina

dawîn a mîrekî kurdan şahîdî dike. û fotografa dawîn a Bîra Qederê, bê-

deng, şahîdî li roja dawîn a umrê Celadet Alî Bedirxan dike.

Celadet Beg dere.

Cemşîd ko hê nû ketiye donzdehan, li pey bavê xwe dimeşe. Serê wî li

ber wî, di navbera mamên xwe de, li pey bavê xwe, cara dawîn, dere. Piştî vê roja germ a havînê, ew ê hew li pey bavê xwe here.

Ew ê hew pê re be,

275

hew pê re bipeyive, jê re bibêje, »Bavo, bavo binêre, ez mezin bûme, ez bûme Mîr Cemo...«

Cemşîd çi difikire, çi hîs dike? Ma meriv li pey mirinê çi hîs dike? Keser, bi tenê keser. Mîna şitilekê, dirêj û zirav, Cemşîd dimeşe û bavê xwe bi rê dike. Kî çi

dibêje, bila bibêje; mirin ecêb e, çûyin û koça dawîn kambax e.

Mirin

keser e. Ew nayê qebûl kirin. Cemşîd li pey bavê xwe dere û wî bi rê dike,  
lê ew ê çawan qebûl bike ko bavê wî dê hew vegere malê, hew bi dengê  
xwe yê gur bipeyive û hew jê re bibêje, »Cemo , kurê min, ez ketime bex-  
tê te, tu min, bavê xwe yê kal, şermezar dernexînî?..«  
Fotografa dawîn a romanê, bergeha dilsoj a veqetînê ye; Celadet Beg ji  
jiyana rengîn, lê pirî caran kambax, vediqete, ji Cemşîd vediqete, ji heval  
û dostên ko di wênê de dixuyin, vediqete, ji Rûşen Xanim, Huseyma, Sînem û Ehmedê Ferman vediqete, ji zimanê xwe yê birîndar û rûpelên kovarên xwe vediqete. Ew ji dinê vediqete.  
Celadet Beg, li ser milên çar kesan, di xewa ebedî de razayî, ji dinê xatir  
dixwaze û dere. Piştî vê fotografê êdî tu kes ê nikaribe fotografên wî bik -  
işîne. Tu kes ê nikaribe wî li ser kitab, kovar û kaxizan bibîne. Tu kes ê nikaribe wî di kêf û henekan de, şîn û taziyan de, seyde û nêîran de  
bibîne. Îro, yanî roja 15-ê tîrmeha 1951-an ko ev fotografa dawîn hatiye  
ki şandin, roja dawîn e. Îro roja veqetînê ye. Piştî îro êdî bi tenê valahî,  
xewn û xeyal hene. Ji îro pê ve êdî rastî dê biqulipin ser xewn û xeyalan...  
Di fotografa yekemîn a de merivek hebû. Di bihara 1893-an de ko dinya û jiyana, ji nû ve, dest bi geşbûnê dikir, merivekî, li ser gi-  
raveke biçk li kamerayê dinihêrt. Meriv navenda wê fotografê bû. Di fo-  
tografa dawîn de jî, dîsan, meriv navend e. Fotografên bi merivekî û hebûna wî dest pê dikir û bi merivekî û çyina wî xelas dibe.

Hatin û çûyin; du haletên herî însanî yê cîhanê. Fotografa dawîn a strana veqetîn û çûyinê, bêdeng, bêzar, dinehwirîne.

2

Kurê min, guhdarî bike, ev strana bêdeng a veqetîn û çûyinê ye, lê guhdarî bike, Celadet Beg li Cemşîd dinihêre û dibêje.

– Na bavo, ez naxwazim lê guhdarî bikim, Cemşîd serê xwe dizivîrîne

û li bavê xwe vedigerîne. Ez bi wê dizanim, min berê jî lê guhdarî kiriye.

Ez wê naxwazim.

Celadet Beg ko li ber serê kurê xwe rûniştiye, dikene, destê xwe yê rastê

276

dibe ser serê lawê xwe û porê wî mist dide. Saet deh û nîvê êvara 14-ê

tîrmeha 1951-an e. Di oda Cemşîd de, bi tenê çira biçk a li ber serê Cemşîd vexistiye. Mal bêdeng e. Ehmedê Ferman, Huseyma, Rûşen Xanim û Sînem, herkes, çye oda xwe. Dinya jî germ e, tevî ko hemû

pencerên malê vekirî ne, germahiyeke giran bi ser malê ketiye. Mîna ko ew gelek caran dike, vê êvarê jî Celadet Beg hatiye oda kurê xwe û jê re tiştine edebî, bi kurdî, dixwîne. Umrê Cemşîd êdî mezin e, ew bi xwe jî, gelek caran, tiştên ed ebî, ji bo bavê xwe dixwîne, lê vê êvarê Celadet Beg dil heye, jê re, ji rûpelên Hawara ko hew derdikeve û hew k es behs dike, hin tiştan bixwîne.

– Berxê min, Celadet Beg dibêje, tu guhê xwe bide vê stranê.

Lamartine, şairê mezin ê fransîzî, ev nivisiye. Bavê te jî ew wergerandiye.

şîreke gelekî zîz e, guhê xwe bidiyê.

– Na bavo, ez naxwazim...

Lê Celadet Beg lê guhdarî nake, ew berçavikên xwe dibe ber çavên xwe,



rûpelên kovarê hinekî ber bi çirê dike û dest bi xwendinê dike, hêdî hêdî;

aûyin; bê girîn û zehmet e; / Ez ê herim... / Mîna pelekî sivik / Ko ba ji darê diweşîne... / Ez ê herim bê ax û zarîn; / Bê şîn û girîn. / Girîn û hêstir ji bona çi? / Ez ê herim! / Mîna ba û bablîsokê, mîna av û ronahiyê... / Xwedê dilê min / Li ser sind iyana jiyînê danî; / û bi girane û zomp ên qehr û xweşiyê lê da...

– Bavo ez naxwazim... Cem99 9îd, bi hêrs, dibêje û destê xwe davêje rûpela

ko Celadet Beg dixwîne. Ez naxwazim li vê guhdarî bikim... Eger tu dê

bixwînî, hingê ji min re çrokeke şehrezadê ya Hezar û şevekê bixwîne...

Celadet Beg, dîsan, li kurê xwe ko di nav ciyan de dirêj bûye, dinihêre.

Cemşîd jî, hinekî bi heyret, li bavê xwe dinihêre. çavên reş ên mîna hev,

bi qasî kêliyekê, li hev dinihêrin. Di bin ronahiya qels a çirê de, çavên Cemşîd, mîna du lib yakûd, dibiriqin. Germahiyekê bi ser Celadet Beg de tê, dilê wî diguvêşe.

– Kurê min, ew dibêje û xwar dibe, ji çavê kurê xwe maç dike. Kurê min... lawê min, pêşeroja min...

Ew çend caran ji çavê Cemşîd maç dike, wî hembêz dike û radibe ser

piyan.

– Ez herim nik eta te Sînemê û ji wê re jî bibêjim »şevbaş«, ew dibêje û

ji odê derdikeve.

277

şev dadiket. Ez û şevê, hevalên hev ên umrê derketî, dê dîsan, bi tenê, bi- mana. şevê dê dîsan ez hembêz bikirama û aliyên xwe yên nû û veşartî nîşanî min bida. Lê berî ko min xwe berda hembêza şevê, min diviya ji

zarokan xatir bixwesta. Hema çî bigire, min ew hew didîtin. Ez li gund, li ser

pembûyan bûm. Pirî caran li wir dimam û bi tenê ji bo tiştên pêwist dadiketim bajêr. Ez û Husên Begê îbîş li hev hatibûn; me dê, bi rêdana

Yezdanê Pak, pemboyeke baş rakira... Wî teksîr nedikir û ew ji tu mesrefê

nedireviya. Min jî teksîr nedikir û ez bi roj û şev dixebitîm.

Divê bête bîra te ka min çawan xwe bi dil û can dabû karê weşandina

kovaran. Her welê, niha jî, min xwe dabû karê çandiniyê. Cemşîd diviya, bi keser û xemgînî, li bisiklêtên hevalên xwe nenihêriya, diviya, mîna hevalên wî, bisiklêtên wî jî hebûna. Sînema min ko bûbû keçikeke xama diviya, bi dilê xwe li xwe bikira... diviya ew neketa pey hesabên qurişan... Min diviya siûda teres a neçariyê biqulipanda ser heyinê. Ne ji bo xwe, lê ji bo zariyan... Lê mîna her tiştî q ayideyên vî şixulî jî hebûn; heçî diket govendê, diviya çepilkên xwe bihejanda. Yanî ez diviya li gu ndê Husên Beg, Hêcanê, bimama û li ser şixul bûma.

Meziyet, xweha min a bextreş ko mîna birayên xwe yên derketî, her bi

derd û kul bû, çbû. Wê agir bi dilê min xistibû û vegeyabû Stembolê. Tevî mêrê xwe yê serserî ko min hî jê hez nekir. Em dîsan ji hev ve- qetiyabûn. Lê îcar, veqetandina me ebedî bû. Hem min hem jî wê fahm kiribû ko me dê nema hevûdu bidîta. Riyên jînê, bêveger, ji hev vediqetiyan. Berî çûyina wê bi du rojan, ez ji gund vegeyiam û hatim malê. çawan çavê wê bi min ket, wê dest bi giryê kir. Di nav wan du rojan de, ew her giryê. şeva dawîn, min jê re çend rêz, bi tirkî, nivisîn, tê de jê xatir xwest û ji malê, nivê şevê, bi dizîka derketim û çûm gund . Gava min ew çend rêz nivîsîn, min dil kir ko oxira wê bi xêr bûya, -tev î ko min dizanîbû, oxira wê ne bi xêr bû...

Tu dê niha bipirsî ka çima ez welê bi dizîka ji malê çm, bêyî ko xweha

xwe hambêz bikim û pê re heta Bêyrûdê herim... Min taqet nebû. Ne hêz, ne taqet, ne jî quwet mabû. Min hew xwe li hember veqetînên zîz radigirt. Ji vê pê ve, ez çî bibêjim? Barên giran ên kurdbûnê û şopên kambax ên salên dirêj ez xistibûm. Rast e, sebir û metanet hîmên esasî yên merivan, nemaze yên merivên demên nû û têko şer in. Rast e, ev herdu meziyet mirovan li ser piyan digirin. Lê belê hest, bîr û bedena min a pîr ko ji xwe bi sebir û metanetê hatibû hûnandin, hew dikarîbû xwe bi sebir û metanetê bineqîşanda û eybên pîrîtiyê veşarta. Sebir û metanet jî, ji hestên

278

westiyayî û bedena kal, bi dûr ketibûn.

Li gund, halê min ne xirab bû. Gundiyên Husên Beg qedrê min digirtin.

Cîh û mala min hebû. Gund, çandinî û pembû jî li jîna min a peregende zêde bûbû. Lê min bêriya zariyan dikir.

– Berxa bavo, tu niviyayî? Celadet Beg li ber deriyê Sînemê radiweste û dibêje.

– Na bavo, Sînem ji hundir dibêje, bavo were, binêre ka ez çî dixwînim.

Celadet Beg derî vedike, bi ken, dikeve hundir û dere li ser kursiye ko

li kêleka textê razanê yê Sînemê ye, rûdine û ji Sînemê dipirse,

– Tu çî dixwîni keça min? – Ez defterên ko te ji bo min û Cemo nivîsîne dixwînim. – Min ew defter ji bo van rojên ko hûn bikaribin bixwînin, nivîsîn,

keça min, Celadet Beg, bi ken, dibêje. De ka ji bavê xwe re bixwîne, ka bavê te çî nivisiye...

Sînem, hinekî din, serê xwe ber bi çirê dike û rûpela vekirî ya defterê dixwîne; »Kurê min, keça min!.. Carinan ji we re hin tiştan dibêjim.

Hûn

bi wan bendewar dibin. Ew bi kêrî we tê. Hûn hineka ji bîr dikin, hinekên din di bîra we de dimînin. Lê heke min ew ji we re nivîsandin û

xistin deftera we, hûn tu car ji bîr nakin...«

Sînem serê xwe ji defterê radike û bi çavên pirsdar, li bavê xwe dinihêre. – ai bû keça min? aima tu sekinî? ew jê dipirse.

– Bavo, ew, bi hêdîka dibêje, heke tu eciz nebî, ez dixwazim tişteki bipirsim...

– Bipirse keça min, çima ez ê eciz bim.

– Bavo, min li rûpelên nû yên van rojên dawîn jî nihêrîn... – Herê?

– Di van rûpelên nû yên defterê de, tu hertim behsa mirin, şîn û taziye

dikî... aima?

Celadet Beg dikene û bi qasî çendekê bêdeng dimîne. Ew nizane çi bibêje.

– Heke tu rastiye bixwazî, ez jî nizamim ka çima ez welê dinivîsim. Lê tu dizanî, bawerî bi mirin û melayka mirinê nabe. Ew ji nişkekê ve tên.

Armanca min bi wan rêzan, heye ku, ev be; heke sî û hilma mirinê bi ser mala me de girt, şîn û taziya mala me divê li gora edet û ûsilên mîran be,

279

li gora rabûn û rûniştina bav û kalan be. Gerek e ko hûn bi van edet û ûsi-

lan bizanibin...

– Bavo, çima tu weha dipeyivî? – Tu guh mede bavê xwe yê kal, keça min... de bavê xwe maç ke û razê...

3

şev daketiye, Celadet Beg Cemşîd û Sînem maç kirine û ew kirine xew. Rûşen Xanim û yên din jî razane. Celadet Beg û şev bi tenê mane. Na, ew ne bi tenê ne. Stêr jî hene. Celadet Beg li salonê, li

erdê, ser xalîçê, xwe dirêj kiriye û dinivîse. Rojeke nû dest pê kiriye. Lê hê şev e, saet li dora diduyên şevê ye. Ronahiya stêrkan xwe ji pencerên vekirî yên salonê digihîne hundir. Xwelîdanka li ber Celadet Beg nîvtijî ye. Dora wî tijî kaxiz e; kovar, rojname, kitab, defter, rûpel, resim û an-sîklopedî, peregende, li ser xalîê ne. Ji gramofonê jî dengê Emû Kalsûmê

tê; ela bela bîhn mehmûdî... welatê min ê delal were, min werbigire û bibe...

Celadet Beg nameyeke dirêj, bi tirkî, ji jina xwe Rûşen Xanimê re ko li

oda kêlekê razaye, dinivîse. Ew jî nizane ka çima ew ne bi kurdî yan jî

fransizî, lê bi tirkî dinivîse. Wî bi »Yavrum Rûşen« dest pê kir û welê bi

tirkî didomîne. Piştî çyina Meziyetê zîziyeke boş hemû heş û bedena Celadet Beg vegirtiye. Hest û hîsên wî teniktir, guman û endîşeyên wî

kûrtir û bîr û heşê wî jî ziravtir bûne. Ji roja çyina Meziyetê û vir ve, ew

her li Rûşen Xanimê û zarokan difikire. Li hember wan, ew xwe çê hîs nake û wîjdanê wî ne rihet e. Loma ew ger bi nameyan ger bi notên ko

ew di defterên Sînem û Cemşîd de dinivîse, her vê nerehetiye xwe diyar dike.

Mîna îşev.

»Rûşena Delal...« Wî weha dest bi nama xwe ya îşev kiriye û wê, hêdî

hêdî, didomîne. Tevî cixare û konyakê. Ew ji cixara xwe nefeseke dirêj

diki9 99îne û dîsan li nama ko li ber xelasbûnê ye vedigere û weha dinivîse; »Ez dixwazim, berî mirina xwe, ko ne dûr e, tiştêkî biçk ji we re bihêlim. Ma ev ne hewce ye?..« Pênûs bi lez nalive, naherike.

Ka ew rojên çyî ko

pênûsê mîna hespekî rewan serî digirt û diç, mîna lehiyekbiharê di- herikî? Ew kî bû ko ev kitab, kovar, rojname û defter nivîsîn? Ka ew

Celadet Begê berê? Gelo ew xewn bûn? Ew jiyana, ew evîn, ew bajar û we-

lat, bûyer û serpêhatî, ew hemû xewn û xeyal bûn? Ew bi tenê xewn û xeyalên romana bûn? Niha, mîna ko Celadet Beg ew ne-

280

jiyane, her tişt jê bi dûr ketiye, perdeyeke reş a windabûn û bîrbûnê di

navbera wî û jiyana wî de hatiye rakêşandin. Mîna ko Celadet Beg, niha,

di nav xewnekê de dijî.

Ew ji qedeha xwe jî çend qultan vedixwe û gotinên xwe yên dawîn ko

bi hezar zehmetî tên heşê wî, bi hêdîka, bi nestnivîsa xwe ya xwar ko hê jî spehî ye, dinivîse; »...Ez welê bawer dikim ko ez bi wezîfeyên xwe, ji bo millet û welatê xwe, bi awayekî baş û heye ko hîn çtir jî, rabûm... û niha

divê ji bo mala xwe jî tiştêkî bikim...«

Ji aliyekî ve, gotina te rast e. Ew şeva ko tu niha vedibêjî, bi rastî jî, şeveke gelekî taybetî bû. Ez di nav xewneke kûr de diçm û dihatim. Rast e, minew name nivê şevê nivîsî. Heye ko saet jî li dora diduyan bû. Lê belê, berî namê, ez derketim der û çûm bajêr. Heye ko te jî bi vê yekê nizanîbû?.. Wê şevê min du tiştên nû kirin; bi tenê derketim derve û gava ez derketim, min qirawat girênda. Min qedeha calvadosê qedand, berik bir devê de- mançê, ew girêda, tevî ko pir germ bû, çakêtê xwe li xwe kir û ez derketim. Em, ez û şev, nasên hev bûn. Di wê germahiya şevê de, ez ji taxa

Muhacirîn daketim sûka Salihiyê. şevê perda xwe kişandibû ser bajêr. Bajar dinivîya. Hin çirayên qels, li vir, li wir, dixuyan. Lê şev ronî bû, stêrkên ko hevaltiya min dikirin, ronahî direşandin ser bajarê kevna. Li ber hin avahiyên mezin pasevanên çekdar hebûn. Hin zabîr, bi lez, diçn. Hin serxweş, bi hêdîka, xwe dilivandin. Ji şeva bêdeng a germ jî dixuya ko bajar di bin hukmê es-keran de bû. Lê ez xerîb bûm, tevî salên min ên dirêj ên bajêr, ez hê jî derketiyekî bûm. Min hê jî li welatekî ne welatîyek hebû, ne jî pasaportek. Min silav da wan û di ber dûkanên Salihiyê re borîm. ai karê min bi wan ketibû? Xerîb diviya di riya xwe de biçya! Carina ji hin derên dûr hin deng dihatin. Qîrîn? Gazîn? Bang? Olana şehwetê? Ma kê dizanîbû! şev bû, di pêşîra xwe de bi hezaran dizî û sir vedîşartin... Ez heta meydanê çûm. Bi qasî kêliyekê, min xwe da ber dîwarê xaniyekî û li meydanê nihêrî. aendîn rojên min liwir derbas bûbûn, min çendîn kes li doraliyên wê dîtibûn, çendîn caran dil ê min, li wir, bi heyecan, coş û keserên bûyeran, tiştan, hilavêtibû... Lê dil niha kal bûbû. Li meydanê, careke din, ez bi vê yekê hesiyam. Paşê jî, paşê jî ez dîsan hilkişiyam jor, nik kalîkê xwe. Mîr Bedirxan li goris-

tana bêdeng, di nav qebra xwe de, mîna her carê, li hêviya min bû. Dapîra min Rûşen ko ji mêj ve ye, ne te qal kir, ne jî min, li kêleka Mîr Bedirxan, tevî ko gora wê ne diyar bû, veşartî bû. Min, dîsan, herwekî ko tu û xwende- vanên romanê pê dizanin, dest bi gotinê kir û bi bapîrê xwe re peyivîm. Lê

281

îcar ez hinekî bi dapîra xwe Rûşenê re jî peyivîm. Niha nayê bîra min ka ez bi wan re çî peyivîm. Her tişt mîna xewnekê bû, di nav mij û dûmanê de

bû. Lê gava ez ji wan veqetiyam, min weha got; »Kalo, pîrê, ez derim, lê ez

ê di nêzîk de, pir nêzîk de, vegerim...« Her ê, welê bû; şeva tarî di êvarê de kifş bû.

Piştî ko Celadet Beg nama xwe dinivîse û wê datîne ser masa xwe ya xe-

batê, ew vedigere ser fotografan. Fotografên wî yên salan jî, mîna umrê

wî, peregende ne. Wan albumek jî nîn e! Ew di nav zerf û rûpelên kitab, kovar û defteran de, hêdî hêdî rengê xwe winda dikin û diqulipin ser rengê zer. Îşev wî hemû wêne, ji cîhên wan ên bêhewa, derxistine û

dixwaze li wan binihêre. Bav û diya wî, li kêlekê, di nav wêneyekê de ne.

Herduyan jî destên xwe danîne ser çogên xwe û lê dinihêrin. Meziyet li pey wan, li pê ye. Safter di nav wêneyeke din de dikene. Di yeka din de, her çar bira, Celadet, Kamuran, Tewfîk û Hîkmet, bi ken, li hev dini- hêrin. Ev herdu sûretên Stembolê, Galata û Bospor, girî dixin çavên wî. Ev çek û pûsatên vê wênê Xoybûn û Araratê tînin bîra wî. Monika, evî-

na çavşîn û porzer lê dinihêre û dikene. Ev porê reş ê bipêl ê Cananê ko ji vê fotoya kêlekê jê re dest dike, dilê wî diguvişîne. Ecêb e... Celadet Beg ev hemû nas kirin, bi wan re mezin bû, bi wan re jiya, umrekî dirêj bi wan re derbas kir, lê niha, di şeveke germ a şamê de ew bi tenê ye, bi tenê li

wêneyên wan dinihêre. Ecêb e, ev hemû dewr û dewran hatine û çne,

umrekî 57 salan di nav van dewr û dewranan de çye. Ew niha çiqas jê bi

dûr in! Ecêb e, tevî ko hin ji wan mirine, hin ji wan, bêveger, jê xatir xwestine û çne, tev î ko wan valahiyeke xed ar li pey xwe hîştine, Celadet Beg dijî. Ew çn, lê Celadet Beg hê jî maye. Ecêb e ko jiyan evçend metîn

1. Lê dîsan ecêb e, tevî ko ew dijî, wî nikaribûye, tu carî, valahiya kes, dewr û dewranên çûyî dagire. Ecêb e, ew dijî, lê di navbera xewt, dewr, dewran û kesên mirî û çûyî de...



Celadet Beg dizane ko êdî dereng e, yan na, di esasê xwe de, wî romanekê diviya. Romaneke nû ko wext, dewr, dewran û kesên mirî û çyî bigihanda hev, ecêbiya hatin û çyinê, jiyîn û mirinê vebigota. Romanekko tê de behsa bîrên wî jî hebûya. Belê romanek ko li ser qederê bûya, li ser bûya.

282

4

«Nav: Gengre (çeşn): Roman Tarîxa destpêka nivisînê 15 Tîrmeh 1951

Destpêk û rêza yekem: Herkes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas... hemû wefat dikin. Dora min jî hatiye, niha jî dora min e...»

Saet li dora 5-ê şevê ye. Stêrk çne ava, ronahî hiltê. Rojke n û ya havînê dest pê dike. 15-ê tîrmehê bi hêdîka hişyar dibe. Celadet Beg hê jî li sa- lonê, li ser xalîê dirêj bûye û li deftera nû ya li pêşiya xwe dinihêre. Ji gramo fonê dengê den gbêjeke tirk tê; her yer karanlyk... her der tarî... fo- to, kovar, rojname, kitab û rûpelên peregende hê jî li erdê ne. Lê tiştê li wan zêde bûye; d eftera li pêşiya wî. Wî deftereke nû vekiriye û tê de rêzên

destpêkê yên romanekê nû nivisîne. Wî navê romanê jî lêkiriye; Bîra Qederê... Pênûs di destan de, defter li pêşiyê, ew difikire. Rêzên pêşîn ên

romana nû ew birine dewr û dewranên kevn û windabûyî. Xwezî ne dereng bûya û wî bikaribûya vê romanê binivîsanda!.. Lê pênûs nalive,

dereng e, pir der eng.

Ji nişkekê ve, deriyê salonê vedibe û Rûşen Xanim di nav kirasê şevê de,

tê nik wî. Ew ji xewê hişyar bûye. Celadet Beg li jina xwe dinihêre, bi ken

û xew li ser çavan, jê re »rojbaş« dibêje.

– Rojbaş, Rûşen Xanim dibêje û tê li ser Celadet Beg disekine û li

rûpela vekirî ya deftera li pêşiyê dinihêre -bêyî ko ew b ikaribe rêzan  
ji hev  
derxe.

– Min çend rêz nivîsîne, Celadet Beg, çavê wî li ser defterê, dibêje,  
çend  
rêzên romaneke nû. Ne yên Heyveron -a ko min dil hebû binivîsa,  
lê yên  
yeka nû...

– Bi xêr be... Te navê romanê jî lê kiriye?..

– Herê, Bîra Qederê... nav wê be...

Ew bi destê Rûşen Xanimê digire û li ba xwe dide rûniştin. Ew jî  
cixara

xwe nefesek dikişîne, rûpela yekem ko wî dest pê kiriye, bi hêdîka,  
ji Rûşen Xanimê re dixwîne û paşê jî gotina xwe didomîne,

– Eger min keys bidîta û bikaribûya dest bi romanekê bikira, destpêk  
wê mîna van gotinên min bûya; Herkes dimire... Min ê qala mirin û  
çûy-

inê bikira. Min ê pêşî xatir bixwesta û paşê dest bi romana xwe  
bikira...

Pêşî mirinê bihata, paşê jîn, xaçeriyên jînê û bi dû re jî dîsan mirin...

Lê

êdî dereng e, hertişt li pey ma. Wext dereng e. şev dereng e. Hêvî  
283

şikestiye, umir kal e. û... û rêwîti li ber derî ye... Mein Gott, mein  
Gott...

Rûşen Xanim di cîhê xwe de vediciniqe, dilê wê pihêt hildavê. Ev çi  
gotin in? aima?.. Ew, bi hêdîka, hîn zêdetir xwe nêzîkî Celadet Beg  
dike

û eniya wî maç dike. Bi dû re jî ew, bi hêdîka, lê vedigerîne,

– aima tu weha dipeyvî? Herkes dizane ko tu mutefekîrekî yekta û  
nivîskarekî jêhatî yî...Tu dê romana xwe binivîsînî, bi îzna Xwedê, bi  
rê-

dan û dilovaniya Yezdanê mezin, tu dê dest pê bikî û wê xweşik binivîsî û her tiştê ko tu dixwazî, tu dê bikî... Ma te ev yeka hanê, sebir û înadaxwe, pirî caran, îspat nekiriye? Ez bi vê bawer im, bi te bawer im, ez bi hevî me.

– Rûşenê, êdî pir dereng e... lê min ê navê li romana xwe bikira... Bîra Qederê... ev nav ê baş li romana min bihata. Quelle titre

pour un roman, pour un destin...

Celadet Beg, mîna ko ew di xewê de be, dipeyive, hem bi Rewşen Xanimê re dipeyive hem jî bi dengekî berz difikire. Ew difikire, di nav xewn, xeyal, bîranîn û rojên bihurî de dere û tê. Digel ko pencerên salonê vekirîne, ode bi dûman û bîhna cixarê tijî ye. Cixare her di destê Celadet

Beg de ye.

– Min ê tê de behsa bîrên xwe bikira. Ev bîrên ko me li gund nû kolane

jî tê de. Wan ez westandim, lê ew ê jîn bidin erd û çolê, pembû dê mîna

berfê bibişkovin...

– Tu dê behsa bîrên xwe jî bikî...

– Ruşencîk, Diya Cemşîd, diya Sînemxana delal... Verba volant, littera

scripta manet... Min piraniya kaxiz û d'efterên xwe yê niviskî, çirandine,

şewitandine, lê min ê ev roman binivîsiya, min ê tê de qala bajarên xwe

bikira, Stembol, kaderîm, benî hî bîr zaman terk etmeyen o müthiş ş e-

hîr Munix, Also sprach Zarathustra... Kahire, Bêrut, şam, Heleb, Di her

destpêka biharê de, em ê hevûdu li Helebê, li meydana Babulferecê bibînin... Paris, la ville des villes... Cizîra Botan a

xewnan, warê bav û kalan, keleha hebûn û bihîstiyariya min, Kanî Xanî, Feqeh-Teyran û Melayê Cizerî, ne jî Batê, kes nema ...

Celadet Beg, mîna ko ew nû ji xewê hişyar bûbe, li ser xalîça rengîn û

mezin a salonê dirêjbûyî, bi germahiyeke bêpayan, li çavên nepixî yên Rûşen Xanimê dinihêre. Hingê, Rûşen Xanim jî nizane çima, lê xofeke

mezin dikeve dilê wê. Gelo?.. Di bin ronahiya çira li ser maseya li kêleka

Celadet Beg, rûyê herduyan jî gewr dixuyin. Rûşen Xanim, bi dilsojî, li

rû û çavên wî yên westiyayî dinihêre. Rûyê wî, digel west û b êxewî, keser

284

û esebiyetê, hê jî, ji xweşî û esaleta xwe tu tişt winda nekiriye. Rû hê jî mî-

na rûyekî ji dem û dewrên Yewnanên Antîk, yan jî ji ya keysarên farisan e. çav mîna du lib komirên re9 99, du libên tiriye reş in, mîna du perçe lûlû ne. Rîh êdî spî bûye, lê ew esalet û xweşiya rûyê Celadet Begê hîn xweştir

dike.

– Tu dizanî, min ê rûpelên romanê bi çi bineqîşanda?.. Bi evîn û hêviyê. Bi van herdu cêwikan. Celebên evînê dê, mîna neqşên Mîr şerfxanê Bêdlîsî, rûpel spehîtir bikirana. L-amour fatale, L-amour douze... Hêvî, xwişka evînê, dê ji rûpelan binihêriya. û min ê ev yeka

hanê bi hevaltîya musîkê bikira. Bilûr, ew dengê wê yê yekta, dê hevaltî limin bikira. Bilûra min, Dengê xwe berde!.. Dinya, Mîna zarokê berşîr, Ket dergûşa xwe; Dengê xwe berde bilûra min, û jê re bilorîne, Xema wê

birevîne! Bilûra min tu yî... û Mahler, Gustav Mahler... min ê hevaltîya musîka Mahler ji bîr nekira, Langsam, schleppend; im Anfang sehr gemächlich. Kräftig bewegt, doch nicht zu schnell...

Roniya çirê Celadet Beg eciz dike. Ew rûyê xwe ji aliyê Rûşen Xanimê badide û çavên xwe digire. Sînga wî ya ko tijî pirçn spî ye, hêdî hêdî, bi nefesê, radibe. Rehên qirik û gewriyê, mîna ko derketibin derve, reş dikin. Bedena wî westiyayî ye. Mêjî kal bûye. Demeke dirêj ew, çavgirtî, difikire, mîna ko ew ji wir çbe dereke din... Rûşen Xanim jî, bi tenê, bê- deng, lê dinihêre. Piştî bîskeke dirêj, gava şev êdî baş diqulipe ser rojeke nû, ew çavê xwe, giran giran, vedike. Niha jî, ji dengê strana tirkî pê ve, bêdengî, bi tenê bêdengî heye. Rûşen Xanim dixwaze bikene, lê ken li ser rûyê wê nivçe dimîne; mîna ko mirin hatibe û li kêleka wan rûniştibe... Rêzên şîrekê, tevî ko ew di hêlekana xewa xem û xeyalan de dere û tê, tên bîra Celadet Beg. Ew, dîsan, bi dengêkî pir nizm, dest bi gotinê, gotina rêzên şîra »Le poete mourant« ya Lamartine, dike; »Ah Ruşen... Dotmamê... Sîha mirinê bi ser serê min de tê; Saeta min a dawîn lêdide; Mirinê nêzîkî li min kiriye; Xuya ye, ez ê bibim mêvanê ax û qebrê; Ma ez çi bikim?..« Bi dû van çend rêzan re, ew li zarokên xwe, Sînemxan û Cemşîd dipirse, hinekî xwe dilivîne, li rûyê Rûşen Xanimê dinihêre û weha dibê- je; »Ew pir delal û jîr in, bi saya te...« Paşê, hêdî hêdî, gotina wî dîsan tê ser nivîsîna romanê.

– Hevaltî û bervajiyê wê, îxanet wê tê de hebûna. Bira û xweh, ap û bi- rarzî, xal û xwarzî dê tê de hebûna. Têkoşîn û şoreşgerî, x westek û hesret,

deng û pejn, ken û girî, tahm û xwîdan û bîhna kaxiz û çapxanê dê  
tê de

285

hebûna. Anliyor musun? Ev hemû dê tê de hebûna. û min ê ew bi  
kur-

dî, bi zimanê bav û kalan, bi zimanê welatê b indest û belengaz  
binivîsiya. Yekîtiya kurdan bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe...  
Miletên bindest heyi -

na xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin.  
O!

yek. Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek be, hingî  
çek

yek bi tenê ye û bend tenê ziman e... Ma min di nav rûpelên Hawar-  
ê de weha nenivîsbû? Belê, min ê bi kurdî binivîsiya...

Piştî van gotinên wî, Rûşen Xanim hew xwe radigire, ew dest bi  
qîrînê

dike û bi qîrînê lê vedigerîne,

– Na, na... aima tu weha dipeyivî? ai bi te hatiye? Tu xewnan dibînî?  
Kabûs bi ser te de tên? Ev çi hal e? Min hî tu weha nedîtibûyî...  
Ezbenî,

ezbenî. Ez ketime bextê te, dev ji erd, pembû, çandin, bîr û  
kolandina

wan berde. Dev ji romanê, jî berde. Me tişteke navê, ne pere  
û dewlemendî, ne mal û mulk, ne jî kitab û roman. Me te divê, bi  
tenê

te...

Piştî ko Rûşen Xanim dipeyive, ew radibe ser piyan û bi girî vedigere  
oda razanê.

Nayê bîra min, tu tişt ji wê berb angê nayê bîra min. Heye ko welê  
bû, min welê gotibû. Heye ko tu niha wan li hev tînî... Lê xew  
neketibû çavê min û çaxa Rûşen, xew li ser çavan, hatibû, ez pê re  
peyivîbûm û min ew rêzên destpêkê nîşanî wê dabûn. Min baş  
dizanîbû ko ew rêzê wê welê bimana. Min ne wext ne jî taqet hebû ko

min ew bidomanda. Min ew nivîsîn, bihêviya ko rojekê yekî din derketa û ew rêz bidomandina. Mixabin min Heyveron nenivîsî. û mixabin min ê jî nikaribûya binivîsanda.

Lê belê, diviya ew roman, bi zimanê birîndar, bihata nivîsîn. Tevî ko ez li

ser rê bûm û diçûm, ez bi hêvî b ûm. Herçend ko jan, mîna filîsofekî gotiye, mamosteyê jînê ye, ewçend hêvî jî gelavêja jînê, yanî stêra rêber a jînê ye. Tevî ko ez bêhêvî mabûm, min dîsan jî hêvî heb û ko roman wê, rojekê, bi- hata nivîsîn. şûr bi qenciya polayê xwe dibire û diçirûse, berhem û eser jî bi destpêk û gavavêtinê bi ser dikeve û diçirûse... Her çawan ko min şopa hinên pêşiya xwe hilda û ketim pey wan, hinên nû jî dê şopa hildana û biketana pey wê. Ma ne welê ye?...

Wext hatiye, Celadet Beg divê haziriya xwe û çûyinê bike. Ew radibe ser

piyan, careke dawîn li wêne, kovar, rojname, kitab, defter û rûpelên li

erdê raxistî dinihêre û dere serşokê. Piştî ko ew ji serşokê derdikeve, ew tê

286

oda razanê, ba Rûşen X animê. Bêguman, xew ji Rûşen Xanimê bi dûr e,

lê bi dû wan gotinên Celadet Beg re, ew li oda wan herduyan, di nav nivî-

nan de digirî.

Celadet Beg tê û li ser textê razanê, li kêleka Rûşen Xanimê rûdine.

Ew,

bi hêdîka, porê wê yê kin mist dide. Rûşen Xanim rûyê xwe di nav lehî-

fan de vedişêre, naxwaze ko Celadet Beg wê çavgirî b ibîne. Ev çi saw e ko

li dora wan dere û tê?..

– Rûşenê, de serê xwe rake, li min binihêre, çavên xwe veke, Celadet

Beg dibêje û serê Rûşen Xanimê ber bi aliyê xwe dizivirîne.

Ken li ser rûyê Celadet Beg dixuye. Wî xwe daye hev, kur bûye, rîha xwe çkiriye û niha bi çavên ronî li Rûşen Xanimê d inihêre. Kincên ro-

jane yên kar û şuxil lê ne. Ya girîng, ya ko herî zêde niha bala Rûşen Xanimê dikişîne, ev e; Celadet Beg bi ken e. Mîna ko wî, berî bîskekê, ew

gotinên goristanan negotibin, behsa mirin û çyinê nekiribe, mîna ko ew, niha, ne ji kabûsekê, lê ji xewneke şêrîn hişyar bûye, ewçend ew

guherî dixuye...

– Ez ê herim ser erdan, îro gelek karê me heye, Celadet Beg dibêje; em

ê avê berdin bîrê.

– Ma ew gotinên berî bîskekê?

Ji wan gotinan pê ve, tu tişt nedihatî bîra Rûşen Xanimê. Gotinan ew

êşandibû. Saw û xofeke ecêb mezin ruh û hîsên wê, ji binî ve, leqandibûn.

– Rûşencîk, tu wan gotinan ji bîr bike. Ew, gotinên romana Bîra Qederê ne. Gotinên nerast, gotinên çêkirî... Tu pêwendiya wan û me bi hev re nîn in. Hem xewa min dihat, hem jî ez ketibûm nav dinya Bîra Qederê. Bila dilê te rehet be, serê xwe bi wan gotinan meêşîne...

– Naxwe, tu dê romana binivîsî? Ne welê, tu dê wê binivîsî? Divê tu wê binivîsî.

– Belê, ez ê wê binivîsim. Ez ê romaneke kurmancî jî yadîgarî kitabxana kurdî bikim...

– Ez di bextê te de me, baş li xwe binihêre. Ezbenî... bila gotinên welê



neyên bîra te. Ez dizanim, bîhna te teng e, rewşa kurdan û halê Kurdistanê nexweş we. Lê ev roj ê derbas bin. Tu ji min çtir dizanî...

Bi van gotinan re, Rûşen Xanim, dîsan, bêdeng, dest bi girî dike. Dengê wê tê birîn. Celadet Beg, bêdeng, serê Rûşen Xanimê datîne ser çoga xwe û destê xwe di nav porê wê de digerîne. aendekê, herdu li dengê nefesên hevûdu guhdarî dikin, bêdeng, li daxwaza dilên hevûdu

287

difikirin. Bîhn û hilma wan a nas rehetiyek, huzûrek dide Rûşen Xanimê.

Wêlê dixuye ko ew naxwaze ko Celadet Beg here. Lê ew dengê xwe nake;

ew dizane ko Celadet Beg ê here.

– Ez divê herim, ez dereng mam. Ji devla min ve ji çavên zariyan ramûse. Di xweşiyê de bimînin...

Gotinên herî dawîn ko Rûşen Xanim ji devê Celadet Beg dibihîse, ev in; Di xweşiyê de bimînin... Gava Celadet Beg radibe ser xwe û diçe, Rûşen Xanim, bi girî, ji paş ve, lê dinihêre; bi çavên şil, li bejna dirêj, b e-

dena lihevhatî, milên fireh û serî mêze dike. Ew, hêdî hêdî, bi gavên gi-

ran, ji ber çavên Rûşen Xanimê ko baş nabînin, winda dibe û dere.

Ber bi

5

gundê Hêcanê, ser erdan, ber bi bîrê, bîra qedere...

Bîra qedere...

Ev bîra ko Celadet Beg niha li berê ye, dê bibe -her- wekî

ku Rûşen Xanim, car bi car, dibêje. Ev bîr ê di nav demeke kurt de qed-

era teres a neçariyê biqulipîne ser heyin û rehetiyê. Ev ê, niha, piştî

bîskekê, av berde erdan û jiyân bide pembû. Bîr av e; av kahnî û geşî ye; geşî jiyân e. Pembû dê bi avê geş bin.

Celadet Beg cixareyeke nû ji pakêta xwe derdixê û vêdixê û ew li bîrê, li

ava bîrê dinihêre. Saet heyşt û nivê danê sibê yê 15-ê tîrmehê ye. Dinya germ, zelal û vekirî ye, li esmên tu ewr naxuyin, esman çikî şîn e. Bi tenê

carina teyrin û refên teyran difirin. Ji dûr ve, ji gund dengê zarokan tê.

Celadet Beg û serpaleyê wî Hesoyê Qado dê îro, av berdîn erdan. Erd di nav keskahiyeke bêpayan de ne. Seranser keskahî ye. Pembû serî hildaye, şitil mezin bûne, şiqil dirêj bûne û bi pelên kesk û mezin hawirdor vegir-

tine. Rengê çikî kesk û yê çikî şîn erd û esman gîhandine hev.

Di nav van rengên germ de, îro, av ê ji bîrê derkeve, biherike û xwe bi

coyên biçk, bi şitilan bigihîne da ko rengê kesk biqulipe ser rengê qerqaşî spî yê pembû. Îro girîng e. Loma Celadet Beg bi hevalên xwe re

neçûye seyde û nêçrê û ew hatiye ser zeviyan.

– Em ê îro piştê felekê bişkînin, Celadet Beg ji cixara xwe çend nefesan

dikişîne û dibêje, îro jîn wê geş be.

– Mîrê min tu dizanî, serpaleyê ko li kêleka wî sekiniye, dibêje. Tu dizanî, lê eger ez bûma, ez ê bisekinyama.

– Na Hesoyê bira, na. Me wext nîn e. Em divê avê berdîn. Bi îzna Yezdanê pak tu tişt nabe.

288

– Husên Begê îbîş jî do êvarê hate gund û ez temî kirim ko ez ji mîrê xwe re bibêjim; bîr ne qaîm e...

– Ez pê re peyvîm, vê sibê em bi hev re hatin. Ew çûn seyde, ez mam...

Na, na tişteki nabe, em ê motorê bişxulînin...

Te vî ko min welê digot, ez bi gotina xwe ne bawer bûm. Lê min, jê pê ve, tu çare jî nîn bû. Me av diviya, pembûyan av diviya. Ji ber sebebê ko tu û xwendevanên romanê êdî baş dizanin, min dest bi çandina pembû kiribû... Berî ko ez dest bi çîroka çandina pembû bikim, min dil heye ko ez bavê xwe b i bîr bînim û sebebeke din jî bibêjim.

Rojekê ko hingê umrê min ne zêdeyî dehan bû, li Stembolê, li bexç mala me, li kêleka bîrê, bavê min bang min û Kamuran kir. Em çn nik wî. Danê êvarê bû. Wî ji purtaqalên ko diya min a dilsoz jê re qaşilandibûn, hinekî dan min û Kamo. Me ew xwarin. Paşê jî, wî destê xwe avêt rîha xwe, pê lîst û li me vegeziya û got, »Kurên min, min li we şîretek heye ...« Mîna ni- ha tê bîra min, piştî ko wî weha dest bi gotinê kir, wî serê xwe ber bi daran kir û bi qasî çendekê li daran û pelên wan ên kesk nihêrî. Ew difik irî. Piştî kêliyeke dirêj, ew dîsan li me vegeziya û wî got, »Zarokno, ev şîreta min li guhê we guhar; hûn bin, tu carî li ber d eriyê dewletê meb in qûl, mebin mehkûmê dewletê, mebin Lala Paşşayê ko bi pereyên dewletê zikê xwe mezin kiriye, lê di eynî wextê de mehkûmê wê ye... Bila tu carî mineta dewletê li ser we nîn be... Vê şîreta min ji bîr mekin.«

Ji ber vê şîreta bavo bû ko ez tu carî nebûm memûr, min nanê dewletê

nexwar û jê tiştêkî daxwaz nekir. Ne ji osmaniyan, ne alman û fransizan, ne jî ereban. Tu carî. Dewsa vê yekê, min kar û şixulên din kirin. û di payiza umrê xwe de jî, ji bo debar û pêşeroja zariyan, min dest bi çandiniyê kir.

Niha em vegezin ser zevî, çandin û pembû... Gundê Hêcanê nêzîkî şamê

bû, bi hêsanî mirov diçû û dihat. Erdên gund avî û biber bûn. Gava min bir- yara xwe ya çandiniyê da, pembû di heşê min de bû. Pembû hê nû ketibû Sûriyê û herkes bi karê pembû radibû -ji ber ko tê de pere pir bû û karekî paqijtir b û. Min ne ji çandiniyê, ne ji pembû fahm dikir. Lê ne xem b û. Ma ez, ji bo go tinên kurdî yên

jibîrbûyî, bi rojan, bi mehan, gund bi gund, nedigeriyam? Ma min li kal û pîr, dengbêj û çrokbêjan guhdarî nedikir? Ma bi vî terhî, ez nebûm hostayê nivisîna zimanê birîndar? Herwekî wê, ez ê bi karê pembû jî rabûma û ez ê hînî wî bû ma. Min kitab, ansîklopedî, ko- var û rojnameyên li ser babetên çandinî û pembû xwendin. Ez li gundangeriyam. Min li pale û rênçberan guhdarî kir, bi axa û began re li ser zevî û

289

erdan geriyam. Bi roj û şevan, hefte û mehan, ez li gund, li ser erdan mam. Welê, bi vî awahî, ez dikarim bibêjim ko ez hînî karê xwe yê nû bûm.

Me tovên herî baş ên pembû hilçandin; Akala, G. Herbaceum a Linné. Ev

tov zexm, qaîm û bi bereket bû, jê ba99 9 ber dihat hilanîn, ew ne bi tenê li erdên avî, lê li erdên bi kîlte û navçeyên hênîk jî dihat. Berî ko em tov bikin, me erdên xwe, baş, cot kirin, giyajeng jêkirin, me erd hazir kirin. Meha ad ara 1951-an, ji hefte diduyan heta dawiya mehê, me tov çandin. Ji ber bextê ç, wê zivistanê dinya ne hişk bû. Baran hebû û bîhna nermahiyeke xweş ji erdan difûriya. Hewa tu carê neket binî 10

Ď... û piştî sê çar heftan,

şitilên pembûyan, hêdî hêdî serî rakirin. Jîn bi wan tovên ko me çandibûn, ketibûn, li her aliyê zeviyên zîl didan. Ez di nav zeviyên de, bi kêfxweşî, digeriyam. Şitilên zirav, dirêj û narîn mezin dibûn; deh cm, panzde, bîst, sî, çil, şest, heftê... Pembûyan mîna zarokê qam didan. Barana mehên adar, nîsan û gulana gelekî alîkarî kir. Dinya jî, pir xweş û bi dûzan, roj bi roj germ dibû. Şax û çiqil jî derketibûn û di rojên pêşîn ên tîrmehê de pelan jî dest pê kir û bişkovîn. Di nav çend rojan de, ji nişkekê ve, zevî, seranser, bûn kesk. Xweda yo ew çi xweşî bû! Dîlana rengê kesk bû...

Lê tiştêkî, hinekî, bîhna min teng dikir; ji hezîranê heta navenda tîrmehê

hî baran nehat. Heke hinekî baran bihata, rewşê hîn çtir bû ya. Lê dinya pir germ, vekirî û zelal bû. Baran û av diviya. Mehên tîrmeh û tebaxê, mehên herî girîng ên pembûyan bûn. Wan serav û avdan diviya. Heke av hebûya, me dê bîkaribûya ji her darê kêmanî bîst qepûşk hilda. Heke bex- tê ç dewam bikira, me dê heta sî qepûşkan jî hilda. Niha, bê av, me dikarîbû di hektarekê de sedûheyştê- dused kîlo pembû û rabikira, lê heke av hebûya hejmarê derketa pencsed- şeşsed kîloyan. Tu dizanî, bav û kalan gotiye; ken ji dilê geş, baran ji ewrê reş tê. Wê meha tîrmehê, herdu jî, gelekî, ji min û ji zeviyan bi dûr bûn.

Loma me dest bi kolana bîrê kir. Bi lez û bez. Zûtirîn wext, me av diviya.

Jixwe erd avî bû, me bîr veda û bi hêsanî av peyda kir. Lê me diviya ew bi zeviyan jî bigihanda. Loma me co vedan, erq çkirin, makîne û motor anîn û bi bîrê ve kirin. Bîra me ya arteziyenê temam bû. Makîne û motorên me pir bi quwet bûn. Gelekî perê me çbû, lê me şixul jî serast kiribû. Lez û beza me Rûşen tirsandibû. Loma jî wê navê bîra me ya nû kiribû »bîra qed- erê...« Ma kê dizanîbû ko ew ê, bi rastî, bibûya bîra qederê!

Kêmaniyeke bîrê mabû; me diwar qaîm nekiribûn û gava me av berda,

bîr dikarîbû, her gav, hilbiweşiya. Hosteyê ko dê diwar qaîm bikirina, nex weş ketibû û nikarîbû bihata. Wext jî li me pir teng bûbû. Ya me dê av

290

berda û qeder biguherta, yan jî na, em ê bi qedera xwe razî bûna... – Huso motorê bişixulîne.

– Mîrê min... em nepên? – Na, me wext tune, em nikarin bipên, tu dest pê bike... Piştî hewldana çend caran, serpale motorê dişixulîne. Motor, bi

dengê gur, dest bi şixulê dike. Av hildikişse, dengê avê tê. Celadet Beg,

kêfxweş, tê nik motorê û ew li motorê û ava ko tê, dinihêre... Av tê, aveke boş, zelal û hênik. Ew cixareyeke din vêdixê û li kêleka motorê, ser bîrê,

li ser totikan, rûdine.

Av; kahniya umir û jînê.

– Binihêre, bû, bû, me bi ser xist... piştî hefteyek-deh rojan, bejna pem-

bûya dê bigêhê esmanan...

Ji kêfa Celadet Beg re payan nîn e. Ji erq û coyan, av, hêdî hêdî, xwe bi

zevîyan digihîne. Erdên zuha dê avê vexwin, rehên pembûyan ê geş bin.

Belê, bû...

Lê ji nişkekê ve, dengêkî kûr û giran ji bîrê tê. ai bû? ai diqewime?

Celadet Beg hinekî xwarê bîrê dibe, lê ew tiştê nabîne. Motor jî, ji nişkekê ve, disekine. Lê ew dîsan dest bi şixulê dike. Dîsan motor dişix- ule û avê dikişîne. Celadet Beg, bi ken, cixara xwe dikişîne. Lê hê cixare di devê wî de ye, îcar, dengêkî gurtir û berztir tê. û tevî deng, ji motorê jî dengê teqînekê tê.

– Mîrê min, mîrê min, serpale diqîre, mîrê min xwe bide alî. Celadet Beg nagihe ko xwe bide alî, hê ew ranebûye ser piyan, ew aliyê bîrê ko Celadet Beg û motor lê ne, hildiweşe. Pêşî Celadet Beg û di p ey

6

re jî motor, bi leza birûskê, gêrî bîrê dibin.

– Monsiuer Bedir-K han, hûn gêrî bîrê bûn, serekdotorê nexweşxana fransizî dibêje, gundiyan hûn ji bîrê derxistin û anîn nik me... Hûn niha li nexweşxana me ne.

Celadet Beg, bi hêdîka, çavê xwe vedike. Her tişt li ber çavê wî, mîna ko di bin perdeyekê de be, di nav reşahiyekê de ye. Li ber serê wî çend kes

hene. Ew kî ne? Celadet Beg nikare rûyê wan baş bibîne. Ew li wan dini-

hêre. Jinikek di nav kincên spî de tê û bi destmalekê eniya wî paqij dike.

– Monsiuer Bedir-Khan, hûn birîndar in, birînên we... hene. Em dizanin, karê me ne hêsan e, lê em ê her tiştî bikin. Em ê, niha, we bibin

emeliyetxanê. Em hêvîdar in ko em ê bi ser kevin.

291

Celadet Beg bi bîhneke giran a derman û nexweşxanan dihesê. Ew têdigêhê ko ew li ser textekî dirêjkiirî ye. Ew diê şe. Hêdî hêdî ew bîr bi êşa

bedena xwe dibe. Her aliyê wî di nav êşeke bêpîvan de ye. Ew dixwaze de- vê xwe veke û tişteki bibêje. Lê nabe, lêvên wî, gewriya wî zuwa ye. Ew zi- manê xwe derdixe û çend caran li ser lêvên xwe digêrîne. Tahma devê wî,

mîna ya jahrê, tahl e. Ew dixwaze rabe. Lê çaxa ew hewl dide ko xwe bilivîne, hemû bedena wî dişewite, mîna ko agir pê ketibe, yan jî zelzeleyek tê de hatibe pê. Ew nikare xwe bilivîne.

– Monsiuer Bedir-Khan, doktor li serê xwar dibe û dibêje, gelo hûn dixwazin hinekî xwe rast bikin?

Celadet Beg pêşî bi çavan bersiv dide, paşê jî ji devê wî gotinek derdikeve,

- Oui... Doktor, jinika kincspî û du kesên din ko li ser serê Celadet Beg in, bi

hêdîka, pir bi dîqet, radihêjin wî û piştî wî ber bi dîwêr dikin. Jinik çend balîvan datîne ber piştî wî. êş... êş... êşa bêp ayan, êşa ko nayê gotin, nayê

teswîrkirin. Xwîdan jê dere. Eniya wî, qirika wî, rû û berçavên wî di nav xwîdanê de dimîne. Jinik, dîsan, bi destmalê enî û rûyê wî paqij dike.

Kincên wî jê bûne, bi tenê derpê lê ye. Jê xwîn neçûye, di tu dereke wî de xwîn naxuye. Hingê ev êş ji kû tê? Ew, niha, hinekî bêtir, bi

cîhên êşê di- hese. Ji doralîyên mil û stû, sîng û kêlek û zik û şeqan  
êşeke zirav, lê xedar,  
dertê.

– En peu... en peu de l'eau, hinekî av, Celadet Beg dibêje, hinekî...  
hinekî..

Jinik dilezîne û jê re qedehê av tîne, serê wî hinekî rast dike û avê  
dibe

devê wî. Av û hênika hiya avê tî û tîna hundirê wî, hinekî, dişkîne.

– Cixareyek, cixareyekê bidin min, Celadet Beg, bi dengê ko bi  
zehmetê tê bihîstin, dibêje.

– Monsiuer Bedir-Khan, hûn cixare nekişînin çêtir e, serekdoktor  
dibêje. Em ê herin emeliyetxanê.

– Hûn cixareyekê bidin min û dev ji emeliyetê berdin... Le temp est  
venu... wext êdî hatiye. Ez, niha, bi birînên xwe dizanim, dev jê  
berdin... û telefonê Madame Bedir-Khan bikin, ji kerema xwe. Berê  
ko ez herim,  
ez wê bibînim.

Ez bi birînên xwe hesiyabûm; ez li rê bûm û diçm. Jîna min li kêleka  
bîrekê dest pê kiribû û niha jî li kêleka bîreke din xelas dibû. Bîr b  
ûbû qed era min.

292

Tu dizanî, gotina bîrê di zimanê kurdî de tê du maneyan; yek av û  
kahnî,

dudo heş... Bîra gundê Hêcanê herdu jî, ji min, bi dûr xistibûn.

Kahniya jîna

min dimiçiqî, tevî ko min hewl dida xwe, he şê min bi derine din diç  
û ez jî pê re dibirim.

Kesin li d ora min bûn, kesin diçn û d ihatin. Bîhna taybetî ya  
dermanan

doralîyên min rapêabû. Hilma mirinê li dora min bû. Ez, şahîdê  
wext, dewr û dewranan, şahîdê du şerên cîhanê, bolşewîzm,  
nasyonal sosyalîzm û faşîzmê, ez, hevalê şevê û zimanê birîndar,  
diçm. Dengên têkel ên jibîrbûyî dihatin guhê min. Dengê nas û



xizmên min, bav û diya min, bira û xweha min, yar û dostên min.  
Wan bang min dikirin. Dengê miriyên min li ber guhê min  
dinehwirandin û gazî min dikirin.

Di nav êşeke xedar de, ez diçûm. Wexta min a xatir xwestinê jî  
nemabû.

Bila Sînemxan û Cemşîd, Huseyma û Ehmedê Ferman, nas û dost li  
min bi- boriyana ko ez weha, bêxeber, diçm. Lê beriya ko perda  
xewa ebedî bi ser min de bihata rakêşandin, min d il hebû Rûşen  
bidîta. Bi alîkariya destên Rûşenekê ez hatibûm û min dixwest, bi  
alîkariya destên Rûşenekê jî ez biçma.

– Cixareyeke din jî bidin min, Celadet Beg, bi xirexir, dibêje.

Deng, pir bi zehmetî, jê derdikeve. Dilopên xwîdanê ji eniya wî ya  
fireh

kêm nabin. Her ko dere, êş zêde dibe. çavên wî tîn girtin. Kesên ko  
li doralî ne, li ber çavê wî, hêdî hêdî, hîn tarîtir dixuyin.

– De zûkin, serekbijîşk dibêje, emeliyetxane hazir e. Jinik û du  
kesên din, bi hêdîka, Celadet Beg li ser text dirêj dikin û çar  
kes, her yek ji aliyekî text digire û Celadet Beg b er bi aliyê  
emeliyetxanê dibin. Ew bi rê dikevin û derin. Celadet Beg çavê xwe  
vedike. Bi tenê ew

rengê spî yê banê nexweşxanê dibîne. Bi tenê rengê spî hevaltiya  
wî ya

çûyinê dike.

Celadet Beg dere, di nav rengê spî de, heşê wî, wî dibe bexçeyekî û  
bîra

bexçe ronî ye, çend zarok li bexçê, dora bîrê dilîzin. Zarok li dora  
bîrê dizîvirin. Darên qaîm ên çinarê bi pelên xwe, bi esmanan  
ketine.

Kulîlkên dareke henarê rengên germ ên keskesorê tînin pê. Gul û  
kulîlk

bişkovîne. Mêş û moz li gulên nûbişkovî vedinjin. aend çivîk li ser  
daran dixwînin. Ji hinekî dûr ve, dengê pêlên zeryayê tê. Kevirên  
bîra ko

zarok li dorê çerx dibin, xwîdan dane, dilop, yek bi yek, ber bi bîrê gêr dibin. Zarok, bi gavên revê, dizîvirin. Yek ji zarokan, mezinê wan, bi

çend gavan li pêş zarokên din dizîvire. Zarokê pêşî hem dizîvire hem jî ca-

293

rîna vedigere û li yê din dinihêre. Ew dest li wan dike. Ew dizîvire, ron-

ahî hîn bêtir dib e, gewrahî hawirdor vedigere. Kêfa zarokê li pêş bêpayan

e, »mehr licht«, ew dibêje û çerx dibe.

Li dora bîrê, di nav ronahiyê de, ew dizîvire...

294

MEHMED UZUN

roman

\*\*

MEHMED UZUN

roman

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

NEFEL

\*\*

## BÎRANINEN MIN

firîda hecî cewarî

ez vê pirtûkê pêşkêşî bîranîna bavê xwe hecîye cindî û dayîka xwe zeyneva îvo dikim. Pirtûk tê weşandinê bi alîkariya serokê

Enstîtûya kurdî ya Parîsê, dostê qedirbilind kendal nezan. Em

sipasiya xwe elamî wî dikin. 2010 FIRÎDA HECÎ CEWARÎ BÎRANINEN

MIN YÊRÊVAN WEŞANXANA "LÎMÛŞ" 2010 389 Rêdaktorê

berpirsiyar: WEZÎRÊ EŞO Berevkirina ser komputêrê, rupêldanîn - FERÎDA HECI 389 Eva pirtûka bi şirovekirina, îzbatîyêd arşîva, qîmetkirina, nêrîna, fotoyava û çend gotarên nivîskarava tê weşandinê ISBN 978-9939-64-036-5 © auiniupti ajp^iiui ^uigtb. 2010p. PEŞGOTIN Ronakbireke me kurdan li paytextê Ermenistanê-Yêrêvanê dimîne, keça kurdzanê mezin Hecîyê Cindî, ya bi nav pasnavê Firida Hecî Cewarî. Zemanê dewî da, bi çend cara ew min, xerîbê li Bêlçîkayê bi hedîya, dîyaryên giranbiha dilxwes dike yê bi sikilê pirtûkên du meznayên me kurdan: yê Hecîyê Cindî bi giranî wek berevokên berhemên zargotina kurdî û lêkolînên li ser wan û yê mêrê wê- Fêrîkê Ûsiv yê bi giranî wek berevokên helbest û destanên wî. Û gava ez pirtûkên wan herdu gorbuhuştan distînim-dest xwe de bi îmêlê yanê jî bi têtêfonê sipasya xwe jêra dibêjim. Van roja jî min du pirtûkên Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv, ku Firîdê ji min ra bi rê kiribûn, stendin: ya Hecîyê Cindî bi semavê Folklorê Kurdan û ya Fêrîkê Ûsiv jî- Pampa min. Vê carê min biryar danî sipasya xwe û bi ser da jî ya hemû hogirên xwe yê pênûsê, hemû ronakbîrên kiird jî jê ra bêjim, hilbet, ku ewê jî yalê xwe da vê destûrê bidin min pistî xwendina vê agahdarya min di malperên kurdî da. Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv kedeke dewlemend kirine û dû xwe hîstine: ji bona gelê xwe. Her çiqasî jî wana zêndîtiya xwe da gelek pirtûkên xwe dane weşandinê, lê dîsa jî hinek ji wana neçapkirî, destnivîsar mane. Ewên wesandî jî bûne degmetiyên bîblografîk, dijwar ji dest dikevin. Bilî vê yekê, ew bi giranî bi tîpên kirîlîk (rusî) hatine çapkirinê û ber vê yekê jî ew hema hema nebûne mal û milkên xwendevanên kurd li dervayî Sovêtstana berê, li Kurdistanê û besên dîaspora kurdî yê dinê. A, ji bona ji holê rakirina van

kêmasyan û astengyan Firîda Hacî ya bi pêşê xwe va mamosta matêmatîkayê, van salên dewî xwe da li ber karê kurdzaniyê û çanda kurdî bi gîstî û edebiyetziyê bi tayîbetî ji bona ji nû va wesandina pirtûkên Hecîyê Cîndî û Fêrîkê Usiv yê çapbûyî û neçapbûyî. Bi awayê xwegîhandinê, xweperwerdekirinê Firîda Cewarî xwe amade kir ji bona wergerandina berhemên gorbuhuştan ser tîpên latînî u bi ser da jî bi.kompûterê daktîlokirina wan. Lê eva hela hê despêka bi cîanîna kar û barê pêwîst bû. Wê gotî ji qulç û bûcaxên arsîva berhemên wan yê hetanî niha yê neweşandî derxistana yê bi destnivîsarên li ser rûpelên kaxazan yê nava zamanê dirêj da zerbûyî, betrengbûyî. Eva jî sûna xwe da. Wê gotî ew berhem ji bona çapkirinê amade bikira bi pêsgotin, komêntar û pênasînên pêwîst va. Û bi xweperwerdekirinê û ji ber wê yekê, ku haja wê ji kar û barê bavê û helalê xwe hebû, ewê ev asteng jî ji ber xwe da rakirinê. Û bi serda jî Firîda Hecî agahdaryên usa ser jîyan, kar û barê Hecîyê Cîndî û Fêrîkê Usiv di pirtûkên berhemên wanda yê ji nû va û cara yekemîn çapbûyî da bi cî kirin, yê ku bilî wê belkî kesekî dinê nikaribûya ew agahdarî bi destxistana, her çiqasî jî ew kes zane û şereza bûya. Belê, wek nefer û mirova ji malên herdu gorbuhuştan haya wê ji hemû kesan bêtir ji jîyan, kar û barê wan heyê. Eva yeka gelek agahdaryên Firîdê jî bona me xwendevanan dike yê ûnîkal, destnekeftinê û ber wê yekê jî yê giranbiha. A bi vî awayî, Firîdê navbera heil-heyşt sala da weke 20 pirtûkên gorbuliuştan dan wesandinê û ne ku bi tenê wesandinê, lê bi dîtina zehmet û mesrefa mezin gelean ji wana digihîne ber destê xwendevanan, bilî yê li Ermenistanê û welatên Yekîtiya Sovêtê ya berê, lê hetanî yê li Kurdistanê û beşên dîaspora kurdî yê dinê.

Berya ji yalê xwe da bi awayê dewîanînê tamkirin û temamkirina kar û barê Firîda Hecî ezê nirxandina hogirê xwe yê pênuşê, sayîrê kurd yê navdar Eskerê Boyîk ya li ser eynî kar û barî bînim navê, ber ku ewê pir pêwîst dibînim. Gava min carekê bi têlêfonê derheqa vî kar û barê Firîdê da sabûna xwe Eskerê Boyîk ra pare vedikir, ewî, ku haya wî jî weke min ji vê yekê hebû, her bi tenê bi sê peyvan ew kar da nirxandinê: "Firîdê şoris kir". Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv yên welatparêz ev keda zengîn ji boy gelê xwe û bi tayîbetî ji bona pêsxistina çanda kurdî kirine. Ber vê yekê jî em xizmetkirina Firîda Hecî di warê amadekirina berhemên wan da ya bona weşandinê wek ya himberî edebiyet û çanda kurdî da dibînin, her çiqasî jî ewê wezîfe, berpirsaryaya xwe himberî bav û malxwe xwe da jî bi cî anîye. A ji ber vê yekê bû, ku min despêka vê nivîsa xwe da ji navê hemû hogirên xwe yên pênuşê, hemû ronakbirên kurd jî sipasî Fîrîda Hecîra ra got. Ne axir xwedîderketina li keda wan herdu mezinên çanda me wezîfa me hemû ronakbirên kurd jî dihesibe. Bi karkirîna xwe ya êgin, jêhatî, bêwesta wê dota gelê me ya sîrhelal barê me ronakbirên kurd, dezgeh û rêxistinên çanda me sivik kir. Ber vê yekê jî ez weke ronakbirekî kurd Firîda Hecî Cewarî bi mafê temam ji bona bi cîanîna vî karê mezin û pîroz dixim rêza ronakbirên kurd yên berhemdar û lêkolîndarên hêja di warê edebiyet û çanda kurdî da û bi serda jî jê ra dibêjim: "Destê te xwes xweyînga me hêja. Te bi kar û barê xwe her wa mêrxwesî, qehremanyek jî kir û bi temamî hêjaye em vê mesela gelê me yê kurd himberî te bi kar bînin: "Şêr şêre, çi jin-çi mêre". Nivîsa min ya ser Firîda Hecî û bi tayîbetî kar û barê wê di nava weşandina berhemên du mezinayên edebiyet û çanda kurdî da hetanî vê tangê amade bû, gava ewê dota kurda sûrpirîzeke nû ji bona min

çê kir: Ji Yêrêvanê li ser navê min bi şandina li Bêlcîka destnivîsara Bîranînên xwe. Ewê bîranînên xwe ji min ra du mereman bi rê kiribûn: yê yekemîn, ku ez rêdaktoriyê li wan bikim, wana serrast bikim, lê ya duyemîn, ku ez hinek dîtî û bîranînên xwe ser malbata wan û bi tayîbetî ser Hecîyê Cindî amade bikim. Min bi dilxweşî pêşniyara Firîde xanimê peju-and, ber ku ez wan bîranînan bona çanda kurdî bi giştî û bona zelalkirina gelek warên jiyana û karkirina Hecîyê Cindî pir mûhîm dibînim. Ezê, ku haya min baş ji jiyana malbata Hecîyê Cindî û wî mezinayê çanda me bi xwe heye, ev Bîranînên Firîda Hecî bi hinek agahdariyên xwe va bûn weke çevkanîke jêfêrbûnê, çevkanîke usa, ku ez ji wê hinek warên jiyana Hecîyê Cindî û malbata wî ji nû va hesiyam, warên ku hetanî stendin û xwendina van bîranînan bi min va tarî bûn. Awa agahdarîke ji wan agahdariyan. Firîda Hecî Bîranînên xwe da qala sala 1948-a dike, gava şipûkeke nû ser gelên Yekîtiya Sovêtiyê da barî. Eva sala dubarebûna zor û zulma desthilata Stalîn ya dîktatoriye ya salên 1937 û 1938a bû, weke deh salan piştî girtin û hebskirina Hecîyê Cindî bi destî îstîxbarata Sovêtiyê - KGB. Eva abbrêviyatûra Komta Aminiyeta Dewletê ya bi zimanê rûsiye. Ev dubarebûna wê zor û zulmê ya dawî bi govek û hêza xwe ji ya yekemîn kêmtir bû, lê ji ber ku xelkê Sovêtiyê û bi wan ra jî malbata Hecîyê Cindî îdî ya yekemîn dîtibûn û giraniya wê ser çerm û laşê xwe tecrûbe kiribûn, vê kompaniya dawî ji ya yekemîn bêtir tirs û xof xist ser wan. Xwendewanê bi hûrgilî derheqa tehsîra vê karapaniya zor û zulmê ser Hecîyê Cindî û neferên mala wî di vê pirtûkê da bixwûin. Di nava Bîranînên Firîda Hecî da cî stendine gelek heval û hogii-ên bavê wê yê nêzîk û bi tayîbetî ronakbîrê kurd yê bi nav û deng, bingehdarekî edebyeta kurdî li

Sovyêtistanê, bepirsiyarê rojnama kurdî ya Rya teze yê kurd yê yekemîn Cerdoyê Gêncî. Gotinên Firîda Hecî, ku Bîranînên xwe da tîne navê, yên ser Cerdoyê Gêncî zanînên me ser wî ronakbîrê pir hêja temamtir dîkin. Mirina Cerdoyê Gêncî ya ji zeman zûtir (41saliyê da) tehsîreke giran ser ruhiyeta Hecîyê Cindî çê kir, ne ku bi tenê ji ber wê yekê, ku ew stûneke xaniyê çanda kiirdî ya navîn bû li Ennenîstanê, lê her usa jî gundiye wî (rûniştevanê Emençayîra herêma Qersê) û hogirê wî yê zarotiyê bû. Bi ser da jî Hecîyê Cindî û Cerdoyê Gêncî bi hevra xistin hebixana KGB û bi hevra jî aza kirin. Firîda Hecî gelekî bi cî û war kifş dîke, ku inirina Cerdoyê Gêncî ziyaneke mezin bû bona çanda kurdî. "Gava gotin dihat ser Cerdoyê Gêncî,- Firîda Hecî Bîranînên xwe da dinvîse,- bavê min digot: "Cerdo rojname (j>a Rya teze- W.E.) dixemiland...Sed heyf kes nivîsarên wî nebû xweyî, berev nekir...". Bi rastî jî gelek nivîs û gotarên wî rûpelên rojnama Rya Teze da bê nav hatine weşandiiiê, ber ku weke bepirsiyarê rojnamê ewî fedî, şerm dîkir navê xwe bin her berhemêke xwe da dayînê, çimkî cama di jimareke rojnamê da çend matêriyalên wî bi xwe dihatin çapkirinê. Lê ew mecbûr dima bi berhemên xwe rûpelên rojnamê dagre, ber ku ronakbîrên kurd salên 30-î pir kêmbûn, nemaze rojnamevan- nûçegiranên kurd. Yên ku hebûn jî payê pirê bi nîvo, bi zanînên xwe ne gorî standarta rojnamevaniyê bûn. Em îdî wê yekê nabêjin, ku bi zemanê herî dirêj Cerdoyê Gêncî serokê Têatira kurdî ya dewletê bûye h gundê kurda yê Elegezê û şopa here kûr hiştiye nava dîroka şanogêriya kui-dî da bi giştî û ya li welatê Sovêtiyê bi tayîbetî. Ez, weke mirovekî, ku baş haj jiyana malbeta Hecîyê Cindî heme, dikarim Bîranînên Firîda Hecî derheqê malbeta wan da îzbat bikim wek yên hêjayî bawer kirina temam û

hinek agalidariyên wê ji bona min jî weke yên nû bihesibînim. Hecîyê Cindî bilî bi cîanîna karekî hêjayî nirxa bilindtirîn di hemû warên çanda kurdî da û nemaze çanda gelerî ya mhî da, di wai-ekî dinê da jî bi kêrî civaka merivayê bi giştî û ya kurdî bi tayîbetî hat: bi mezinkirina û gîhandina pênc keçên xwe û danîna wan ser wê xizmetkirinê, hilbet, ne bê alîkariya hogira xwe ya jiyanê Zeyneva Ivo. Hecîyê Cmdî, yê ku bi şev û bi roj ser berhemên xwe kar dikir, wezîfa xwe ya bavtiyê ya terbiyetkirina zarokên xwe jî qet ji bîr nedikir. Ewî herpênc keçên xwe dan ber xwendinê û herpênc jî xwendina bilind tamam kirin. Ji wana dudu bûn doktorên zanînan: Firîca gorbuhuşt doktora zanînen doxtiriyê, dosênt, lê Nûrê-doktora zanînen hunermendiyê. Firîde bû matêmatîsiyên, da û Zîne - kîmîk, jî lê Nazê jî matêmatîsiyên bajarê di warê yê kîbêmêtîkayê Biryanskêye. naha mamosta Zanîngeha Rûsiyayê Herpênc zarên Hecîyê Cindî jî bûn ronakbîrên bi kêrhatî gorî zanînen xwe, ronakbîrên xudanê zanebûnen kûr û dewlemend, ber ku ew rê bavê wan xistibû û weke Firîda Hecî Bîranînen xwe da kifş dike ji wanara gotibû: "Em baylozê (ambasadorê) gelê xwene nava biyaniyan da". Ev gotina Hecîyê Cindî dihate wê menê, ku ew û neferên malbeta xwe berpirsiyarên gelê xwene û gotî bi kar û barê xwe ne ku bi tenê şexsê xwe, lê gelê xwe jî nava biyaniyan da rûsipî, serfiraz û serbilind bikin. L) gorî vê gotina bavê û bi serda jî bi mîsala karkirina wî bi xwe ya bê westa û bê hêwişandina hêz û hereketê xwe keçên wî, weke dibêjin, hetanî ji wana hat xwe dane ber xwendin-perwerdê, ku bibin kadroyê bi kêrhatî û bavê xwe bi wê yekê kêfxweş û serbilind bikin. Firîca, wek xanim-xatûneke kurmanciyê ji bona miletê me jî bû sedema serbilmdiyê. Ezê mîsaleke biçûk derbai'ê wê yekê da bînim navê. Salekê keça mine



bi navê Karê nexweş ket û me ew xiste wê nexweşxanê, di kîjanê da Firîca Hecî wek seroka beşekê wê kar dikir. Wî zemanî Kara min hê şeş-heft salî bû. Gava wê didît, ku di wê nexweşxanê da ji nexweşan girtî hetanî nexweşmêz û doxtiran bi çî awayî rêz û hurmeteke mezin Firîcêra digrin, heval û hogirên dora xwera bi quretî û serbilindî bi zimanê wan yê ermenkî, yanê jî rûsî digot: - Hûn zanin, ku Firîca Hecî meta mine? Lê çiqas keç û kurên yên dinê û dê û bavên wan jî bi pêra bi Firîcê kêfxweş û serbilind dibûn. 8 Di nava keçên Hecîyê Cmdî da Nûra Hecî Cewari xwe li rêç û şopa bavê gut: bû zaniyara himera kurdî ya stranê û mûzîkayê û ne ku tenê çend berevokên têkistên stranên kurdî bi notan va dane weşandmê, lê bi pêra jî lêkolînên kûr di warê hunera kurdî ya stran û mûzîkayê da bi cî anîn. Xiyala bavê, ku qet neve keçeke wî xwe h kurdzaniyê bigre, bi serê Nûrê hate sêri û nemaze xiyala derheqa wê yekê da, ku stranên kurdî yên gelerî bi notava bèn tomarkirinê, ber ku ew gelekî dêşiya, ku zemanê xwe da ewî pir têkstên stranên kurdî berev kiribûn, dabûn weşandinê, lê bê nota. Her çiqasî jî Firîda Hecî pêşê xweva matêmatîsiyêne, lê dawiya dawiyê, temenê mezin da xwe li kurdzaniyê girt bi amadekirina lêkolînên bavê xwe û têkistên zargotina kurdî yên ji yalê wî berev kirî û çapnebûyî, lê her usa jî berhemên mêrê xwe-Fêrîkê Ûsiv ji bona weşandinê bi wergerandina wan hemûşkan ji tîpên kîrîlîk (bi giranî-msî) ser tîpên latînî û çapkirma wan bi komêntêr, pênasîn û jêrenotan va. Derheqa vî kar û barê Firîda Hecî yê hêjayî nirxa bilind me despêka vê pêşgotina xwe da gotiye û em wê yekê dubare nakin. Her bi tenê emê kifş bikin, ku di warê kar û barê wê da, weke gelê me dibêje, van Bîranînêd wê serê lodê girt: wek gurzê dawî. Ji bona keçên Hecîyê Cindî îdêala

mirov tayê û ronakbîrtiyê ya here bilind bavê wan bi xwe bû, ew bav, kîjail rûniştevanên Ermenîstanê yên kurd, ennenî û milletên dinê, weke dibêjin, ji dûrva bi tiliyên desta nîşanî hev didan û digotin: "A ew Hecîyê Cindî yê nivîskar û zaniyarê kurd, ku haqasî pesinê wî didin, ewê hane". Bilî vê yekê, zarokên Hecîyê Cindî jî çûktiya xwe da li ber çevên xwe didîtin, kanê çiqas mirov dibin hewcê zanîn, nav û deng, riîmeta bavê wan ya mezin ii bilind, ji gundî û bajai^vanên basît girtî hetanî nivîskar û zaniyarên bi nav û deng yên kurd û yên biyanî. Ê ji ber vê yekê bû jî, ku zarokên wî hêwil didan hêjayî wî nav û dengê wî yê bilind bin. Tehsîra Hecîyê Cindî ya qenc ser zarokên wî qet jî bi şîretên vike-vala çê nedibû, lê bingeha çêbûna wê tehsîrê, sebebên wê tehsîrê yên bêtir sêriyoz hebûn, ku em dikarin weke yên objêktîv bi nav bikin. Faktoreke here giring ya wê yekê, ku Hecîyê Cindî tehsîreke mezin, hilbet, weke me got, bi qencî ser zarokên xwe çê kir bona ku bibin ronakbîrên kêrhatî ji bona civaka mirovatiyê bi giştî û ya kurdî bi tayîbetî ew bû, ku awayê jiyan û karkirina wî ji bona wan bû mîsala jêfêrbijn û çevlêdanê. Zarokên wî didîtin, kanê bavê wan bi çî awayî bi zemanekî dirêj ber textê xwe yê nivîsandinê rûdinî û kar dike... Ez sebeb û bingehê serkeflina Hecîyê Cindî û zarên wî ya here giring dihesibînim tifaq û yeltîtiya wî û pîreka wî - Zeyneva îvo û wê rewşa aramî ya ku ji ber vê yekê malbata wî da çê bibî. Ez dikarim bi bawerîke tamam bêjim, ku haya hemî mirovên nas û nenas ji wê tifaqa malbata Hecîyê Cindî hebû û gelek bo yî vê yekê xwezila xwe li wê malbatê danî. Ê di vî wari da roleke serekîn Zeyneva îvo dileyîst. Wê kulfeta aqilbend her wa hewil dida, ku avtorîta mêrê xwe ne ku bi tenê nava xelkên derva da, lê her usa jî nava zarên xwe da bilind biparêze. Meta Zeynev jî karê

ronakbîrtiyê bi cî danî bi serrastkirin û amadekirina berhemên malxwê mala xwe bona weşandinê ii nava prosêsa çapkirinê da. Hecîyê Cindî rêz û hurmeteke bilind bi hêjatî helala xwera digirt. Mirov her bi tenê dikare ser vê tifaqê, ser vê hevrûniştandina van mêr û jinan metelmayî bimîne. Wek haya min jê heye, Hecîyê Cindî, ku weke xwe bi pûnktûalî, bi rêk û pêk herroj bûyerên nava jiyana xwe da û bi giştî nava jiyana kurdên Ermenîstanê ya çandî li ser kaxez tomar dikirin, lê pêra negîhand bi pirtûkeke cuda, bi awakî, weke dibêjin, dûr û kûr bîranînên xwe binvîsîne û bide weşandinê yên ser jînenîgariya xwe û ya heval û hogirên xwe. Pirtûka Firida Hecî "Hecîyê Cindî, jiyana û kar"(s. 2007), ku dîyarî bû ji bo 100 salya dayîkbûna Hecîyê Cindî û usa jî eva pirtûka ya Bîranînên wê hetanî warekî kêmasiya di vî wari da çêbûyî dadigrin, tamam dikin ii weke yên nefereke malbata Hecîyê Cindî dikarin bibin çevkanîke jêbawerkirinê ji bona zaniyaran, yên ku bixwezin lêkolînan bi cî bînin ser warên jiyana, kar û barê Hecîyê Cindî, hetanî karaktêrê wî jî. Hecîyê Cindî mezmayîkî çanda kurdiye û bi vê fikirê Bîranînên Firida Hecî yên gelekî pêwişt û bi nirxin. Hêjabûn û mûhîmbûna van Bîranînan, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, di nava ûnîkaliya wan dane: heger Firidê ew bîranîn nenivîsandana kesekî dinê û tu zemanî da nikarbiî ew karê giring bi cî baniya; weke wê. Ez bi bawariya tamam dikarim bêjim, ku ev pirtûka Firîda Hecî Cewari wê bi balkêşîke mezin ji yalê xwendevana û lêkolîneran da bê xwendinê, pejirandinê û bi karanînê. Oxira qencyê be ji vê pirtûkê ra. WEZÎRÊŞO 10 Dê û bavê min: Hecîyê Cindî û Zeyneva îvo, s. 1981 Salên 20-î yên sedsala 20-î Bavê min - Hecîyê Cindî, sala 1908-a li gundê Emençayîra qeza Qersê, lê dayîka min - Zeyneva îvo li gundê

Êngûkê dîsa qeza Qersê da, sala 1914a hatibûne dinê. Salên sêrrê cîhanê yê yekemîn, ewana dê, bav, kalik, pirik imda dîkin û êtîmxanada mezin dibin. Salên rev û bezê kalikê min îvo (bavê dayîka min) dimire. Gundiyê Êngûkê mihacir dibin, têne Ermenîstanê, diçine bajarê Êcmîazînê. Li wê derê ewana pê dihesin, wekî bona zarê kurde êtîm Aştarakêda êtîmxane vebûye. Pîrka min -Şaka Ereb, tevî 2-3 kûlfeta, tevî zara bi zor-cefakî têne Aştarakê, diçine wê êtîmxanê. Mezina xwendî, egin pîrr êtîmxana - Nûra eyan Aştarakê Egît axa kûlfeteke Polatbêkova Nûrê kurde bûye, xanim Nûraxanim xûşka şorişvanê Zeno û Bondo Sîbîryayê Fêrîk Polatbêkov. êtîmxanêda qebûl dike, lê Zevo, ku qîza mezin bû û Pêrîşana biçûk qebûl nake. Pîrka min 2-3 cara ser zarê xweda tê-diçe. Û wê şûnda, diya min pê dihesê, wekî diya wê û Perîşana xûşk ji birçîbûnê û nexweşiyê mirine, lê Zevo apana dane mêr, Wê êtîmxanêda tevî Nûra Êgît Elîxanê Serdar Şahînov, kîjanî sêmînariya Yêrêvanêye rûsî xilaz kiribû, kar dikir. 11 Payîza sala 1921-ê bajarê Êcmîazînêda Êlîfba kurmançî bi herfên ermenkî çap dibe, û xudanê wê elîfbayê, emekdarê çanda gelê kurd Lazo (Hakob Xazaryan) tê wê êtîmxanê û bi wê pirtûka "Şems" zarê kurda hînî xwendinê dike. Diya min gilî dikir, digo: -Apê Lazo yekî zef heyf bû, mera digo "berxikê min". Ewî zaru dora xwe dida rûniştandinê, pirtûkên "Şems" dida destê me û em hînî xwendinê dikirin. Me hevra dixwend: "...yekşam, duşam, sêşam".. usa têne {bi herfön û armenîd evan xebera xwendinê.- F.H.) nivîsarê zarê Wê êtîmxanêda heta 50-60 kurd hebûne. Ji wanin: nivîskar, rêdaktorê rojnama "Rya teze" Cerdoyê Gêncî, xûşka wî -Tezo, birê wî- Şiko, zimanzan, Biroyê doktor Memo, Çerkez pîreka Bakayêv, kurapê wî - serokê Xwendinxana kurdaye pêdagogiyê Casimê Celîl-

Xanima Rizgo, pîreka Biroyê Mamo - dersdara baxçê zara Hisreta Mîrze, sipîkêra radîoyê bi zimanê kurdî salên 30-î, pîreka H. Cindî - Zeyneva îvo, birê wê Bondoyê îvo, mamostê dibistana gundê Şamîramê Usivê Elî û yên din. Dayîka min heta sala 1926-a Aştarakêda dimîne, paşê wana divine Celaloxliyê (niha Stêpanavan), paşê îcêvanê û pey kutakirina dibistana hevtsaliyêra, sala 1930-î, sê keçika tînin keçên kurd jî Yêrêvanê, hebûn: wekî karxanada bixebitin. Nava wanada Zano - Zeyneva îvo, Xanima Cerdoyê Rizgo Gêncu wexta û wê Hisreta Mîrze. Nivîskar demê tevî Zerîka dima bermaliya û xwe pê Yêrêvanêda Hecîyê Cindî û Zeyneva îvo, s. 1931 dihesa, wekî keçikê êtîmxana waixe Aştarakê anînê bajêr, diçe wana dibîne, teglîfî mala xwe dike. Mala Cerdoyê Gêncoda bû, wekî Hecîyê Cindî rastî Zeyneva îvo tê. Hecîyê Cindî û Cerdoyê Gêncu alî van hersê keçika dikin, wekî Têxnîkûma (Xwendinxana) kurdada qebûl bin. 12 Bavê min - Hecîyê Cindî, li êtîmxana Emêrîkê ya li Qersê, paşê ya Giunriyê mezin dibe. Vê dokûmanê da tê gotinê: "Hevalê Hecîyê Cindîsalên 1926-1928 êtîmxana Amêrkomê da serokê kolêktîva komsomolaye ne legal (ya dizîkava) bûye. Pey kutakirina Xwendinxanêra, kûrsên kurt yên hazirkirina amade hema havîna sala kuta Ew 1929-a, ew mamosta kiribûn. dike, « .. kîjan wezaretê Ermenîstanêye ronkayê kûrs hatibûne amadekirinê, ji ber ku dibistan derbasî elîfba kurdaye teze dibûn. Dersbêjê wan kûrsa sazîkî wê elîfbayê - dostê gelê i\* ->>> -^ me îsahak latînî) Maragûlovê kitêba mexîn (asorî) "Xu bû. xu ;fff-le zinni '-XSHOblt'^ H Vi3 AflA Hema wê salê bû, wekî bi wê elîfbayê (bi tîpen zimanê kurda JtTimAlîl hînbûna xandina nivîsara kurmancî" ronkayî dît. Ew îsahak Maragûlov û E. Ş. Erebe Şemo-F.H.) amade kiribûn. (yanê: <DA>UV>IVITenb Pey wan kûrsara,

çawa mamostê zimanê kurdî bavê min dişînin dibistana gundê Qundexsazê (niha Rya teze). Wê yekêra tevayî ewî li dibistana gundê Camûşvana mezinda (niha Elegez) dersê zimîn kolxozvanê ciwanra bi cî danîn. 13 Hecîyê Cindî (rûniştî,ji çepêyê sisya) tevîxwendkarênxwe (kolxozvanên ciwan), gundê Elegezêda, sala 1929-a Salên 30-î Hecîyê Cindî sala 1930-î tê Yêrêvanê û Zaningehêda, beşa filolojiyê da tê qebûl kirinê. Salên 30-î bi biryara Moskvayê - peytextê Yekîtiya sovêtê, komara Ermenîstanêda ocaxên kurdaye candê, xwendinê vedibin. Ji 25-ê adara sala 1930-i da rojnama "Rya teze" çap dibe. Hecîyê Cindî hema wê salê jî çawa serwêrê para wê rojnamêyî çandê û edebyetê Sala 1930-î da bi xemxurîya Hecîyê Cindî sêksya (beşa) nivîskarên kurd rex Asosîasiya nivîskarên Ermenîstanê tê amade kirinê û bi xwe dibe serokê wê parê. ; Vê dokûmanê da tê gotinê, wekî H.Cindî ji sala 1930-î heta sala 1968-a serokê kurd, lê sala beşa ntvîskarên ew Endemê Yeldtiya 1933 mi-i~ ; Komîtêya amadakirirta nivîskarên Ermenîstanê bûye, piştira (salên 1934-1968) endemê Serwêrtiya Yemtiya ntvîskarên Ermenîstanê bû. 14 "Yêrêvan xeber dide, guhdarên ezîz, bibihên xeberdana - eva me cumla hê bi zimanê sala kurmancî... payîza 1930-î cara yekemîn bi lutvê dê û bavê min: Hecîyê Cindî û Zeyneva îvo bi radîoya Yêrêvanê belayî cîhanê dibe. . . Dayîka min gilî fikir, wekî ewana heta sala 1932-a herro pênc deqa radioya kurda da diaxivîn, paşê, zeman zêde kirin - hetanî 5 deqa, tevî deng û besên nû usa jî Zeyneva îvo sala 1931-ê bi radîoyoya Yêrêvanê deng û besê tezeji rojnama "Rya teze " dixûne. berhemên dixwendin. biçûk; yên nivîskarên kurd Me, li vir ji arşîva bavê xwe, nivîsara serokê axavtinên radîoya Ermenîstanê Yêxîşê Hovanêsyân cî kirye, li ku tê

gotinê, ku Hecîyê Cindî û kevaniya wî Zeyneva îvo Cewarî salên 1930-1937-a radîoya Yêrêvanê ya beşa kurdîda çawa sipîkêr kar kirme. Ber ku, eva nivîsara sala 1983-a da hatiye nivîsarê, Yê.Hovanêsyar usa ji nivîsiye, weki H.Cindî ders dane sipîkêrên kurde ciwan {derheqa sipîkêrên salên 50-60 da tê gotinê-F.H.) 15 Meha çille sala kurdîye 1931-ê Yêrêvanêda Xwendinxana pêdagogiyê (dersdarhazirkiriuê) (têxnîkûma) vedibe. Pex Pişkavkazêye Xwendinxanê kûrsên dersdaraye yeksale jî vedibin. Hecîyê Cindî heina ji wê salê heta meha adarêye sala , ;; 1938-a (heta girtina xwe) wê Xwendinxanêda dibe mamostê zimanê kurdî. Xwendinxana kurdî ya Pişkavkazêda û dibistananên gundên kurdada ders bi zimanê kurdî dihatine derbas kirinê, zilam û zarokên kurd bi zimanê xwe dersê zimanê kurdî, hesaba (matêmatîkayê), û dersên wan tebiyetzanîne, din fêr dîrokê, fîzîkayê, Idinyayê, dibûn. dinyazarmiê Bona derbaskirma darsa kedkarên çanda kurda Rûbên Drampyan, îsahak Maragûlov, Asatiîr Xaçatryan, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Nûrî, Fetiyê îvo, Vardan Pêtoyan, yê din pirtîkên wan Tital Mûradov û darsa ji zimanê s "en'nenkî werdigerînin ser zimanê laardî. Dibistanada u xwendinxana (têxnîkûma) kiudîda bi wan piititka ders dane. Dêmek, Ermenîstanêda salên 30-î gundên kurdada dibistanên kurdî hebûne. Wan sala weke 70 pirtîkên darsa têne weşandinê. Hecîyê Cindî, k-u pirtûkên Elîfba û yen Zimanê dê didane weşandmê, ewî usa Xelîlê Esed, apê Hecîyê Cindî (bavê min salên 30-îra.itî du apanên xwe-Xelîl û Têl hatiû)jî. ji pirtuka Matêmatîkayê bona darsxana 1-ê ji zimanê ermenkî wergerandibû ser zimanê kurdî. Ji vê dakûmanê tê kifşê, wekî "ji 25-ê ilona sala 1932-a Vê dakûmanêda tê gotinê: Yêrêvan. nivîskarê hird hev.

Hecîyê Cindîra. Beşa ronkayêya nawça Talînê elametiye dide we, wekîme navê we daniye ser dihistana gundê Berroj Hecîyê Cindî tê kivşkirinê wekserokê beşa xwendinê ya têxnîkûma kiirda". (Dûzkend) 3-ê liezîrana sala 1935 16 Kê dokCanauê da tê gotinê, wekîH. Cindîji sala 1932-a (dema hela Li vir tê gotinê, wekîH. Cindîsala 1933-a Weşanxana dewletêda wek karêktorê (temizkirê têksta) pirtûkên kurda kar kiiye. x^vendikarê Zanîngehê bû - F.H) înstîtûta Dîroka çandê da kar kiiye. Bona giringiya karê Hecîyê Cindîye pêdagogiyê navê wî didin ser dibistana gundekî kurda yê Ennenîstanê. Pey girtiiia bavê mim-a navê wî ji ser dibistanê tê hildanê. Pey afû kirinêra îda bavê rnin guh nade wê pirsê. . . 2-ê tebaxa sala 1933-a bi biryara Katibiya konmierkeziya partiya Komûnîstiyêye Ermenîstanê Hecîyê Cindî dikine nava komîtêa amadekirina YeMtiya nivîskarên koniara Ermenîstanêye sovêtiyê. Sala 1933-a bavê min Zanîngehê kuta dike. Payiza sala 1933-a Hecîyê Cindî înstîtûta dîroka çandêda çawa aspîrantê dereca berevkin û lêkolînkirina folkilorê tê qebûl kirinê. Profêsor Asatûr Xaçatiryan tê kivşkirinê çawa serwêrê wî. Hecîyê Cindî bi aktîvî beşdarî karê bi cîanîûa konferansa Kurdzaniyê ya bi goveka temamiya "Ife, "i Yekîtiya Sovêtiyê H peytextê Eimemstanê Yêrêvanê dibe. Konfêrans 8-ê hezîranê sala 1934-a Yêrêvanêda vedibe. Zanyarên Yerêvanê, Moskvayê, Lênîngradê, Tibîlîsiyêye navdar, dersdarên ziman ■û ,. edebyeta kurdî yên dibistanên kurdî, ku Ermenîstanê, Azerbêcanê û Tûrkmenîstanêda hatibûne vekirinê, ""■^' xudanên kitêben zimanê kurdiye dursa û rewşenbîrên mayîn tevî wê konfêransê divin. 17 Dayîka min sala 1934 ■a du Xwendinxana kuta dike: Xwendinxana kurdî û ya ermenî yên hema ji wê salê jî êw wek mamosta dersê



tebiyetzaniyê xwendinxanêda bi cî tîne. Û usa jî di Kûrsêd hildana nexwendîtiyê di nava jinada dersê zimanê km-dî dide.

Xwendkarên wê bûne Eznîva Reşîd, Almast, Asa jina Eliyê (naha .i'^ Hecî ji gundê Firîca Çobanmazê Xudo, jina Avşên), Ûzoyê Bekir ji gundê Pampê, Nîna, Nazê, Gozê.... Eva şedetname dayîka mine, derheqa wê yekêda, wekîewêsala 1934-a Têxnîkûma (Xwendinxana) kurdîxilas kirye. Mandata Hecîyê Cindî Hecîyê Cindî çawa dêlêgat tevî xebata kongirêya Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanêye pêşin dibe (sala 1934-a). Li vir ew tê hilbijartinê çawa endamê serwêrtiya Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê û dêlêgatê kongireya Nivîskarên Yekîtiya Sovêtistanê. Ew kongira Yekîtiya nivîskarên sovêtistanêye pêşin bû. Ew 17-ê tebaxa sala 1934-a Moskvayêda vedibe. 18 Hecîyê Cindî sala 1934-a bona karê nehêvişandî di dereca hildana nexwedîtiyê Hurmetname komara Ermenîstanêva tê rewakirinê. <i!iMi! tnf Hurmetname Sala 1934-a Hecîyê Cindî wek endemê (parlamêntarê) şêwira bajarê Yêrêvanê tê hilbijartinê. Hecîyê Cindî yê welat, dê û bav undakirî bi hesta xwe texmîn fikir, wekî durr û cewahirê gel: beyt-serhatî, hikyat, kilam, meselok jî dikarin bêne unda kirinê. Sala 1936-a nimûnên zargotina kurmanca, ku navbera çend salan da wî ji zarbêja nivîsî bû, bi pirtûkeke mezinva bi semavê "Folkilora kurmanca" rûpêlên nivîsîne). wê tê weşandinê 570 rûpel tê wan (ji 650 H.Cindî sala du Bîra min pirtûkên ku bavê min amade kiribûn, dayîka min başqe, bi xemxurî wana xwey fikir: ew "Folkilora kurmanca" ya sala 1936-a û "Kilamêd cimeta Hecîyê Cindîji Hesoyê Memo gundê Hekoda zargotinê dinvîse, s.1931. kurmanca" bûn bi notayên mûzîkayê yê kompozîtor Karo Zakariyan, ku dîsa wê salêda çap bûbû, ewê digot - bavê we dibê: zefbihagiranin". \*\*\*

'Evan pirtûkana Sala 1936-a bavê min dixwest bibûya endamê Partiya Komûnîstiyê. Bavê min dikire bîra xwe, digot: 19 Katibê teşkîleta xwendinxanê yê partiyayê A. derkete pêşya min. - Ew çawane, - ewî got, - profesor Xaçatiryan tu cara aspîrantên komûnîst û wîye? komsomol xwey nake, lê Hecîyê komsomol aspîrantê Û... dengê xwe nedane min. Wî çaxî qedirê min ket: nas û nenas digotin: "Hilbet, vê ortê tişteki mera neeyanî xirab heye, ku Hecî hilnedan nava cêrgê Partiya Komûnîstiyê..." Dîsêrtasîya (têza) min derheqa lênihêrandina êposa "Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvî"-da tam hazir bû, lê xweykirina wê şûnda dêxistin, ji ber ku besa derheqa "eksîşorişvanî û nasîonalîstiya" mînda gihîştibû înstîtûtê jî. Ji arşîva bavê min: "Fermana hejmarê 395-a ya dîreksîya (serwêrtiya) xwendinxana pêdagogîyê ya 7-ê cotmeha sala 1937-a. Ji 6-ê cotmeha îsalinda dersdarê Xwendinxana pêdagogîyê yê zîmanê kurdî Hecîyê Cindî ji xebatê azadkin: 1. Bona gotina wîye nasîonalîstiyê (miletperestiyê). 2. Bona çapbûna gotareke wî di rojnameke welatê derekeda ya ramkavar - daşnaksakana ya miletçîtiyê da... Hecîyê Cindî ji hemû kar û baran avîtin... Pey erza şikyatkirinê Hecîyê Cindî meha çille ya sala karên xweda tê dasekinandinê. Tenê radîoya kurdî 1938-a xwe axavtinên berdewam nake. Lê piştî du meha -adara sala 1938-a bavê min digirin, dikine hebixanê. Nivîskar û dîrokzanê ermenî Armênak Manûkyan di pirtûka xweyê "Zext û zoryên sîyasî Ermenîstanêda salên 1920- 1953-a"-da nivîsiye: "...Gere serda zêdekin, wekî makîna zordestiyêye merivxur usa jî hindava wekîlên kêmetewada hêwşandin dîhar nedikir, xweber femdariye, wekî gilî derheqa rewşenbîradane. Bahara sala 1938-a rewşenbîrên kurd, endemên Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê, rêdaktorê



min timê diya xwera digo: "Ya "Hirçê" mera bêje, lê ewê çawa rê nas kiriye?.. çawa mal dîtiye, unda nebûye?" Dayîka me, çawa pîreka "dijminê dewletê" ji karên mamostatîyê ji Xwendinxana kurdî derxistibûn û bo xweykirina me ew li karekî dinê xwera digerya. Ez digiryam, min digot: -Lê kanê bavê me? Xûşka min digot: - Şevêkê sê meriv hatin, bavo birin, tu razayî bûyî, lê ez hişyar bûm û min ewana dîtîn,- digot û kere ker digirya... 21

Hatin oda me çûk ji me stendin, gotin: -Hûn sê neferin, odek besî weye. Ez zef berxwe diketim, min diya xwera digot: - Cawane, emê îda bavê xwe nevînîn?... \*\*\* Rojêkê sibê zû dayîka me em rakirin, go: - Kincê xwe zû-zû xwekin, emê herine baxçê zaroka. Azgûşa hevala bavê weye êtîmxanê ez hildame ser kar, ezê baxçê zarokada çawa terbetdar kar bikira u hûnê tim ber çevê min bin. Ji wê rojê da sibe-sibe kere-ker em radibûn, lezo bezo me xwe davit baxçê zara. Êvara jî dereng dîsa tirse-tirs, wekî tu kes me nevîne, dihatine malê. . .Xûşka min digot: - Mama me (rûsî: dayîk) ditirse, me rêva bigirin û sirgûnkin, bişînin Sîbîrê...(de min tirê Sîbîr cîkî terî û sare...) Carekê me dît hevalêkî bavê me ber bi me tê. Ez zef şa bûn, ew bû ezê birevyama ber bi wî... giryam... Malda dayîka me go: le ewî bi lez riya xwe guhast... ez - Ber xwe nekeve, tirs dilê gişkada heye, divek rairovekî xirav ew raêrik bi mera bidîta, şikyatê wî bikra û ew jî bixistana hebisxanê. \*\*\* Diya me rokê ser şirîta balkona me (hewşa me) xalîça meye mezine bedewe gulgulî darda kiribû ji bo dawşîne. Xalîçe şev dikeve bîra diya min, radibe diçe balkonê, dinhêre xalîçe tune... zef xemgîn dibe, derbanga sivêra ew derdikeve kûçê xalîçê bigere. Pîrek rastî wê tê û jê dipirse: -Qîza min, te xêre, çi bûye, tu vê sibê zu çi digerî?., Paşê, gava derheqa undabûna xalîçêda pê dihise, ji dayîka me dipirse: -

Dergê tengda kî te heye? Diya min dibê: -Malxwê min! Pîrê dibê: - De îda here, here mala xwe, ida xalîça xwe negere, - û lêdixe diçe... \*\*\* Meha adarê bû, teze terî ketibû erdê, meta Almasta jina apê Emîn hate mala me, diya minra go: - Zanî, Emîn kaxez stendiye, sibê wê dada lawika, dada Hecî û 22 Cerdobe. Gazî Emîn kirine çawa şede,- got û bi lez ji mal derket, çû. Paşê diya min pê hesiya, wekî çawa şede gazî nivîskarên ermenî Hiraçiya Koçar, Harûtyûn Mikirtçyan û Casimê Celîl jî kirine (bavê min navê wan herçar şeda dabû). Dayîka me paşwextiyê gilî dikir: "Dad, dada lawika, sibê..." çend deqa min ev xeber wekilandin- nizanbû şabûma, yan bigiiyama.. . Min rica ji cînara xwe Vardanûşê kir, wekî ber we be, û ez reve - rev çûm mala Cerdoyê Gêncî, çûm Zeîka jina wîra jî bêjim. . . Em ser hevda giiyan, û ez melûl vegeryam malê. Şev xew nekete çevê min.Sibê şebeqê min hûn birine baxçê zara. Min destûra xwe xwest û berê xwe da hebixanê - kela NKVD (ser soqaqa Nalbandyan). Zerîk îdî wir bû. Baran dibarî, em şil bibûn, lê fikira mera derbaz nedibû, wekî vezerin, herin malê...Me hevra xeber dida : "Gelo wê çawa be, gelo dadê çi biryar bigire, gelo, gelo..."Me dua Xwedê dikir, hîvî jê 'dikir, wekî bê hewara me û zarokên me." Roja duda dayîka me dîsa em hiştin baxçê zarada û dîsa çû ber kelê sekinî. Roja sisya dayîka me dîsa çû dadê. . . Vê carê era mane bal cînara me Vardanûşê. Vardanûş mera heyf biî, diya me digot, wekî mêrê wê jî girtine, birine, ew jî hersê zarokên xweva tenê mane. -Roja sisîya,- dayîka min gilî dikir,- xweyê girtîya hiştin herine hundurê avayî: em çend taqa peyayî jêrê kirin û kêleka sera dadê dane sekinandinê.Nîvro dadê navbirî da. Leşkerek em tev dan ber derîkî, ber rae sekinî û her heyşt girtî yên kurd-ser rûyê wan hatî,

raelûl ber mera derbaz bûn. Ewana dora xwe nedintêrîn. . . Pêşiya gişka yekî bilindî bedewî porsipî diçû: paşê era pê şer hesiyan, mêrxasê wekî ew Cangîr Axa bû, ew mêrxasê raêrxasa, hogirê ermeniya Andranîkê seresker bû, wekî pêşberî tirka kiribûn, nivîskar Ahmedê Mîrazî û seresker Şarail Têmûrov jî nava wanada bûn. Min Hecî dît, te digo xûn ji dilê rain niqîtî - heyfa min wî hat, zef hatibû guhastinê. . . Êvarê dad berdewara bû. Kesî mera tiştê nedigot. Me nizanbû, wekî ew roja dadêye dawiyêye. . . Derê sera dadê vebû. Mera gotin: "Werin hundurda rûnên". Em bi tirs û kere-ker ketine hundur û ser kursiyên paşin rûniştin. Ser dikê kes tunebû. Min aliyê girtiya nihêrî, lê ewana serê wan ber wanda me nedinhêrîn. . . Derê pêşiyê vebû, dadkir hevalê xweva hatine hundur. 23 Em rabûbûn şipiya. Min texmîn Icir, ku çokê rain dilerizin. Çi deqê çetinbûn... Ê dadkir biryara dadê xwend. . . Arşîva bavê minda biryara wê dadê heye: "15,16, û 17-ê adara sala 1939-a civîna dadêye derîgirtîda şuxulê gunekarkirina. . . . Hecîyê Cindî û Cerdoiyê Gêncî (û yê din - F.H.) - hatin Hecîyê Cindî, lê nihêrandinê... Dadê pîrsa wan nihêrî û biryar girt: Cerdoiyê Gêncî, Ahmedê Mîrazî. . . afû bikin". Diya min digo: "Bextê me anî - Hecî, Cerdo, Ahmedê Mîrazî, Şamil Têmûrov û yekî dinê jî bi biryara dadê ji hebixanê azad bûn, wana afû kirin. . . Belê, Hecî ji kelê aza bû û em hevra vegeryan, hatine malê. Ez ji şabûna digiryam, Hecî ber dilê minda dihat û hey bi dilxweşî digot: - Ez pir ji xwe razîme, wekî sivte heta kutasiyê rain şer ne avît xwe, ne jî heval-hogira. . . , ne zêrandin û ne jî buxdana û ne jî etavên, ku danîn serê min - nikarbûn min mecbûrkin, qewata nihê min qelskin. . . Şedetî û axa'vtinên nivîskarên ermeniya yê navdar Hraçiya Koçar û Harûtyûn Mikirtçyan jî, hemîn, serê lodê girtin.

Bavê me digo: - Rastî jî bextê min û çend lawika anî. Wan salên zor û zulma Stalîn merivên amûtam digirtin û zef cara bê dad ewana yan sirgûn dikirin, yanê jî giille dikkin. Me bavê xwe bîr kiribu, nediçûne bal wî, hema dû diya xwe digeryan, diçûn, diliatin. Ewê jî digot: - Pî similla, we xêre? Hela vê ecêvê binhêr, we çi zû bavê xwe bîr kir? Kêm hatiye serê Hecî, niha jî hunê bavê xwe hêrskin? Bavo digo: - Evda xwedê, te ji zarê min xêre? Salekê ez ne li malê bûme, zarone, bîr kirine... Firîca xûşk cama gilyê dê û bavê min minra digot: "Baxtê me aniye bavo vegeriya hate malê". . . Min ji wan xebera fem nedikir- bext çiyê, çira aniye? Derheqa Firîca xûşkda diya min digot: - Firîca zareke pirr girînok bu, şev-ro digirya. De salen 30î wexta ez diçûrae tevî bavê we beşa radiyoya Yerêvanê ya kurdîda çawa sipîkêr kar dikir, min zef cara zarê xwe xwera dibirin, lê wexta diçûrae Xwendinxanê - min zarokê xwe dupa bal Hisreta qîzapa Hecî dihiştin, 24 yan cera Kazo, yan cinarên din. . . Çawa dihatime malê, cînara digotin: "Deqekê kerrbîna Firîcê tunebûye". Lê wexta ber çevê Firîcê Hecî girtin birin, de wê rojêda Firîcê terka giryê xwe da, te digot ber çevê min Firîca min mezin û femdar bûbû"... Bave rae teze ji kelê hatibû raalê, êvarekê derê me xistin u yekî bilindî, porkurîşkî bedew hate mala me - dîtina Hecîyê Cindî.De ew du sal bû kesî derî me venedikir... Ew nivîskar Wezîrê Nadirî bû.Bavê min ji ciyê xwe rabû, ewî û apê Wezîr hev hemêz kirin, hev bemedidan. Me dît şabûna wan herda, çevê wane bi hêsir tijî. . . Çend wekî deqê din herdu jî çevê rûniştin.Lê hev ecêb ew bû, Wezîrê Nadirî xeber nedidan, dinhêrîn, beşereweş dibûn, hey bi dezmalê hêstirê çeva temiz dikirin. . . Dayîka min dikire bîra xwe: "Nişkêva Hecî tninra got: - De rave, navînî mêvanekî ezîz hatiye malê, rave nan dayne.

Ez ha-hanga rabûm, lê Wezîr go: - Na, xûşkê, ezî lezim, merî hîviya mine. . . Hecî medê xwe kir, ewî tire "hineka" ew şandine mala me, wekî wanara derheqa Hecîda gilîke...Wezîr jî texmîn kir, wekî Hecî medê xwe kir, go: - Hecî, ê ne tu Paysarê nas dikî, ewe hîviya min. Hecî bi dengê şabûyî û beşerxweş go: - Paysarê silavkî,- û ewana xatirê xwe ji hev xwestin, û Wezîr çû. De xalê Wezîrê KLnîyaz Nadîrî bii, xweş mêr bû, doktor-profêsor Hecîyê Cindî tevîKînyaz Mîrzoyêv Kînyazê îbrahîm Mîrzoyêv, ku naka li Qazaxistanê dijî." \*\*\* Pey azabûnêra ew 7-8 meh bûn, bave me wê sivê ji malê derketa, êvarê wê bihata westiyayi, xeragîn û bi hers digot: - Kar nadine min "dijminî", divên: "Kar bal me tune..." Ez 25 divêm: "Ciyê karê minî berêda- înstîtuta zaniyariyêda, xebatekê bidine min, ê ne dadê ez afû kirime? Karê min instîtûtêda nîvcî mane... Ê, kêra dibêjim? Bersîva wan eve: "Kar tune". . . {De ocaxên kurda -radiyo, rojname,Têxnîkûm, beşa nivîskarên knrd, dibistanên kurdî hatibune dadanê, zarokê kurd îda bi zimanê kiirdî hîn nedibûn, diçûne dibistanên ermeniya). Rokê bavê me hate malê kêfxweş, kaxezek destê wîda bû, hey wî kaxwezî dinhêrî, hey beşerxweş dibû, digot: -Fadêyêv minra têlêgram şandiye... şikir ji tera, Xwedê, van roja pirsên xebata min û oda rae we bêne çareserkinê. Nivîskarê rîs Alêksandîr Fadêyêv serokê Yekîtiya nivîskarên temamyâ Sovêtistanê bû. Têlêgramêda hatibû nivîsarê: ..,..\_\_\_\_,,<sup>TM</sup><sup>TM</sup> \_ "Yêrêvan, meydana ser navê Lênîn, Yekîtiya nivîskara, nivîskar Cindî Cewarîra. Min Hamtyûnyanra xeber daye. Ew lai vegeiya (ji Moskvayê - F.H.) wê alîkariyê bide we.Bi silav Fadêyêv ". Harût^ojnyan Erraenistanê bû. (Harûtjamov) serokê Partiya Komûnistiye ya Diya min digo:-Şikir tera, Xwedê, vê şabûna rae zêde hesab nekî, karê Hecî rastkî.



Fadêyêv... Paşê minra gotin, wekî hê sala 1934-a bavê minî 26 salî tevî nivîskarên ermeniya yê bi nav û deng hatibû hilbijartinê çawa dêlêgatê kongira nivîskarên temaraiya Sovêtistanê ya yekemîn. Li Moskvayê, civînêda, bavê min nasiya xwe dabû Aleksandir Fadêyêv. Payîza sala 1939-a Fadêyêv hatibû Ennenistanê û bavê min 26 çûbû bal wî derheqa rewşa xweda jêra hûr gilî gotibû, wekî çawa ciyê amûtam hatiye girtinê, paşê afu kirinê, naka jî azadiyêdane, lê kesek guh nade wîya, kar nadinê û odek me jî ji destê me girtine. Piştî çar roja, me tirê mala meda eyde: siveda dê û bavê min rabûbûn, dayîka min bi esq û ken (de zûva me dê û bavê xwe usa dilşa nedîtibû) teştîya bavê me hazir kir, bavo teştê xar, ewî em paç kirin û ji malê beşerxweş derket. Me ji dayîka xwe pirsî: -Bavê me kuda çû? Ewê bi şabûn go: - Çawa kuda çû? Çû înstîtûta xwe, çû ser karê xweyî berê. . . \*\*\* Roja bavê me wa dest pê dibû: sive-sive ber textê xebatê rûdinişt, ez divê dinivîsî, ka wê rojê da çi karî bike, paşê dayîka min serrûyê wî hildida, ewî serçevê xwe dişûşt, digot; "Er hemdilla, şikir"...Dayîka me nanê wî dadanî, ewî dixwer, û bavê me diçû ser karê xwe. . . Lê piştî kar, dihat dîsa ber textê xwe rûdinişt, rojnîşa wî hebû, 10- 15 deqa dinvîsî {ka roja wî çawa derbas bûye, çi bûyêr wê rojê da çê bûne), destê xwe dişûşt û seheta 5-a me xarina xwe dixwer. Degime diqewimî, wekî ber textê meyî nanxwerinê mêvanê me tunebûna. Salên 40-î Meha kanûna sala 1940 bû. Berî êvarê mirovên ermenî hatibûne mala me, diya rain şivekî baş hazir kiribû, mêvanê me bavê me bi dil pîroz dikirin, şa dibûn. Paşwextiyê minra gotin, weki bavê me Têza xweye dokoriyê xwey kirye û bûye doktorê zaniyaryê yê dereca yekemîn- kandîdatê zaniyariyê. Sala 1941-ê lêkolîna Hêcîyê

Cindîye dîsêrtatsyone "Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvf" wek pirtûk hazir bû, ku bê weşandinê. Wî zeraanî bi daxweza dewleta Sovêtiyê gelên welêt, yên ku hetanî hingê elfeba latînî, yanê jî erebî bi kar danîn, gotî elfeba xwe bi tîpên kîrîlîk (rûsî) çêkirana. Wê pirtûkêda pêşgotin, lêgerîn bi zimanê ermenkî bû, têkst bi kurdî, ermenkî û rêzyûmê û pêradanok - rûsî. Bi qayilbûna dîrektorê înstîtûta ziman û edebiyetê prof Mêlikyan têksta êposa "Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvf"-ye bijare, ku pirtûkêda hebû, sala 1941-ê cara ewlin bi herfên kîrîlî hate weşandinê (bi çend herfên latînîva). 27 Piştira Hecîyê Cindî elfeba kurdaî ya kîrîliye teze hazir dike (ewa ku ewî "Kerr û Kulik"da dabû xebitandin, hevekî dide guhastinê). Ew elfeba sala 1941-ê ji aliyê Hukumeta Ermenîstanê da tê pêjirandinê. Lê şerê cîhanî yê duyemîn mecal neda, ku pirtûkên kurdî bi herfên kîrîlî çap bin û pirsar wan herfa ji ortê dertê. 25-ê hezîranê sala 1944-a elîfba teze, xudanê kîjanê Hecîyê Cindî bû, ji wê aliyê komîsiyayê bûn: da tê lênihêrandinê akademiya û qebûlkirinê. Endamên komîsiyayê endamên Ermenîstanêye zanyariyêye eynsî G. Xapansiyar, H. Açıryan, usa jî E. Evdal, W. Nadirî, C. Celîl, Nûrê Polatova, N. Maxmûdov, Xaxaxêsyan. Sala 1946-a bi wan herfan "Elîfba" Hecîyê Cindî çap dibe. Hema wî çaxîda jî destbi weşandina berhemên nivîskarên kurd bi herfên kîrîlî (rûsî) dibe. \*\*\* Ez divê sala 1940-î bû, caw şandibûn, wekî Têliyê apê bavê min bethale, gotiye: " Bera Hecî nesekine, bê Tbîlîsiyê". Apê Têlî temî dabû bavê min, gotibû: - Hecî, miqatî herçar zarokê min bî (Leyla keça wî îdî mêr kiribû). ji çepê- Firîde, Firîce, Piştî mirina apê Têlî bavê me çû H Cindî, Zînê, Mecîd, s. 1947 Tbîlîsiyê, du zarê apê xwe Zînê, Mecîd anîn 28 mala me. Ew zaru çendekî mala meda man. Paşê çû herduyê çûk jî

anîn - Gulê û Şamil. Dayîka wana- Dîdarê zutirekê mêr kir. Tenê du odê me bûn, ciyê me teng bû... Bavê min ew zar Yêrêvanêda kirin êtîmxanê. Tim guhê wî ser wan zara bû. Lê rojêd leda sivê radibû diçû pey wan zara, danî malê. Diya min jineke heyf, pîrr bînfîre bû, digot: -Mixabin, ciyê me tenge, yanê na minê wana malda xwey kira. Dema ew zaru dihatine mala me, mala meda dibû eyd - dê û bavê min her yekîra pêşkêşek dikirî, ber wan dadanî. Paşê ewan mezin bûn, Zînê zû mêr kir, Mecît bû hosta- her tişt ji destê wî dihat, Gulê xwendinxana pêdagogiyê kuta kir, Şamil xwendina bilind sitend, xwera bûne malavayî. Naha tenê Gulê maye, ew tevî zar û neviyên xwe Rûsyayêda dijî. Vê dokûmanêda tê gotine, wekî "Hevalê Hecîyê Cindî sal'en 1941 -42-a çawa dersbêjê zimanêfarisî beşa aspirantûrayê ya înstîtûta Yêrêvanêye Pêdagogiyê da kar kirye. \*\*\* Firîca xûşk diçû dibistana rusî. Mala meda kesekî rusî xeber nedida. Bavê me jî rûsî kêr zanibû, ew jî temamyê rojê mijûl bû, diçû ser karê xwe, piştira malêda ji ber zarê mêvana (baweriya we hebe, herro mevanê me hebûn) zargotin dinvîsî. Xûşka minra cetin bû, rûsî kêr zanibû. Hevala wê avayê meda dima. Bavê min rica diya wê- Galya rûs kiribû, wekî Firîce tevî keça wê dersê xwe hazirke... Firîca me zef xîret bu, zef aqil. Îda zûtirkê dersê xwe xwexwe dikir û mamosta wê jî pesinê wê dida. \*\*\* Nûra xûshka min teze hatibû dinê, nava bêşikêda bû. Nûrê Polatova (dota Egît axa Polatbêkov) tevî malxwê xwe Wezîrê Nadirî 29 hatibûne mala me. Bavê min go: -Xûşka Nûrê, ji hizkirina dinyalikê me navê keça xwe jî daniye Nurê. Îjar Nûra xanim-xatûn pêşkêş, xelat xûça mera anî bûn, danî bin belgiyê Nûra me, ewana eniya Nûra me paç kirin, navê wê pîroz kirin, paşê dayîka me texte danî û ewana heta êvarê dereng mala meda derheqa êtîmxana Aştarakê da, seroka kîjanê

Nûra xanim bû, kxu'dzaniyêda xeber didan. Gotin, şerê gêrman destpê bûye (^şerrê cîhaniyê yê duyemîn,) ...Apê Xaço jî şêrrda bû û piştî çend rojan yekî neme anî mala me. . .Dayîka min neme vekir û bû qûrînya wê, giiya: go: - Xaço şêrrda şehîd bûye...,- û em tevî dayîka xwe giryan... Paşê bavê me ji karê xwe hate malê, diya min kelogirîjêrago: - ^^axHaw ' "K^sza reş" hatiye . . . '^Wf/t^ Xaçoyê Cindî (1910-1941) Bavê me axînek rahişt, çû ber textê xebatê rûnişt, jgia djiê wî rabû girya, paşê bi dengekî melûl got: . j^^ xaço! Bîra min tê, dayîka min ber dilê wîda dihat, digo: -Hecî can, ez qurban, şerê faşîstane, şerr kesî nahêvişîne, hilbet ew jî yaziya wî bû. . . Dayîka min paşwextiyê gilî fikir, wekî ji êtîmxana Gumriyê, ku Hecî tevî birê xwe Xaço diman, zarê biçûk biribûn bajarekî din. Xaçoyê 4-5 salî jî nava wanda bû. Piştî 3- salan zarên biçûk dîsa şûnda anîbûne Gumriyê. Hecî nava wanda birê xwe geryabû, nedîtibû. Jêra gotibûn: "Navê vî gedeyî Xaçîke, dive eve birê te?" Hecî ew hesab kiribû wek birê xwe û xwedî lî derketibû. Me zef cara ji zarê bavê xwe bihîstiye: "Ax, birao, birayê min tayê bi tenê, gelo tu kuyî?" Hela ez jî difikirîm: "Çawane, bîr kirye, wekî apê Xaço şêrrda hatiye kuştinê?" Dayîka min digot, wekî bavê me timê Xaço danî bîr û digot: "Divek ew birê min nîbûye? Dive Xaço saxe?" Ew şik, wekî "ew Xaçîk" diqewime ne birê wî bûye, heta hetayê jêra bûbû xem. . . (Derhega undabûna birêda bavê min romana xweye "HewarV'da nivîsiye: "...Axir minjî bira unda kirye. Birayê min tev hevdu pênc 30 salî bû, lê ez çî bêjim, çî bêjime xwera: ne zanim heye, ne zanim tune, ne rengê wî tê bîra min, ne bejin û bal... " (binhêr romana "Hewarî", Yêrêvan,1967, rûpêl 12). Salêd şerê cîhaniyêda Komîtêya komsomala ya Ermenîstanê Hecîyê Cindî çawa zanyarê korasomol, zaneyê zimanê kurdî û

ermenî dişande nawçên Elegezê û Talînê, bajara û gunda, kn bona ermeniya û kurda lêksiya (dersa) bixûne. Ewî nava binelyada karê agîtasyon dikir, biryarên Partiya Komûnîstiyê û dewletê, elemetiyên înfonnyûroya sovêtiyê nava gelda bela dikir. Pey şêrra, bona karê xweye agîtasyonê berbiçev û kardar di salên şerê cîhaniyê da, Hecîyê Cindî hate rewakirinê : Sala mezinda", 1946-a sala bi Mêdala bi "Bona xebata 30 efat li şerê welatîyê Şerê 1975 Mêdala "Bona saliya serkeftina weteniyê mezinda", sala 1985 bi Mêdala "Bona 40 saliya serkeftina Şerê weteniyê mezinda".

Salêd şêit tevî karê xweyî agîtasyon, ji dengbêj û zarbêjên kurd û ermenî, ku berhemên zargotina zamanê şerê sêwirandibûn, wan berhemên berev dike û salên şerê dû pirtûkên çijke ya kilama tevî kompozîtor S. Gasparyan dide weşandinê bi semavên "Weten" û "Ewledên weten" (salên 1942 û 1943). Salên şêrr da rewşa meye aboriyê ne pak bû. De em pirr nefer bûn, tenê bavê me dixebitî. Hevalekî bavê min sêwîxanê hebû, navê wî nayê bîra min, serokê bajarê Gumriyê bû. Rokê Yêrêvanêda rastî hev tîn, mêrik divê; - Hecî can, neferê mala te zefm, alîkarî lazimbe, were bal min. . .

Carekê bavê min diçe Lênînanê (Gumriyê) bona karê xweyî agîtasyon, piştira gotina hevalê wî, ku serokê bajêr bû, tê bîrê û diçe bal wî, bona pirsê alîkariyê...MêrLk ne li bajêr bûye û bavê min bi trêne tê heta stansiya nawçê Talînê, wekî ji wir here gundê Heko, bona dîtina neferên baltûza xwe û bona karê xweyî agîtasyon. Gundîkî ji gundê Heko erebêda kêlekê rûniştî bûye, mêrik pê dihese, wekî heval ji Yêrêvanêye, dibê: - Zevayê Zevoya gundiya me, navê wî Hecîye, nivê Yêrêvanê destê wîdane, pirr dewletîye. 31 Bavê min dengê xwe nake... Hekoda mêrik hew dinhere bavê min diçe ber bi mala xatiya Zevo... Bavê min tê mala

baltûza xwe, gilyê xwe û wî camêrî dike, Teyoyê bacanax bi ken divê: -Hecî can, dengê defê ji dûrva xweş tê,- û wî gilî hey dikine bîra xwe û hey dikenin. . . Nîsana sala 1945-a bû. Dayîka min herdu xûşkê mine biçûkva çûbûne gundê Şamîramê. Ewê baxçê zaroka gundada vedikir û bi xwe jî dibû terbetdara wan. Wê salê ez û xûşka mine mezin Firîce tevî bavê xwe Yêrêvanêda mabûn, hê mehekê jî em gotî biçûna dibistanê, dersê xwe. Çend roj mabû, wekî şerrê cîhanî yê duyemîn kutabe, xelqê ew yek texmîn dikir, şabûn ketibû dilê îsanan. Kesî bawer nedikir, wekî neferê wan. . . mêr, kun- û birê wan wê ji şêrr venegerin, hineka digot: "Kaxeza reş" hatiye, lê divek nav û femîl şaş kirine, divek lawik saxin? "Wê bên, wê bên", - û. . . bi guman hêvî benda kutabûna şêrr bûn. . . Çend bîranîn derheqa Cerdoyê Gêncoda, apê Cerdoda (1904-1945), yê ku çend roja berî kutabûna şêrr, pey nexweşiyêra ji wede zûtir -1-ê gulana sala 1945-a, hisreta emir di nava çevan, çû ax û berê sar. Apê Cerdo gundiye bavê min bû, hevalê wî yê nêzik, ewan mîna birayên helal bûn. Mirina hevalê Hecîyê Cindî yê nêzik ne ku tenê bona wî, usa jî bona çanda kurda ziyaneke mezin bû. Salên revê-bezê, yê şerê cîhanêyî yekemîn da, dê u bavê Cerdoyê Genco dimirin û ew heta sala 1924-a êtîmxana Aştarakêda dimîne. Ew endemê komsomola bû, paşê bû komûnîst. Sala 1926-a Cerdoyê Genco tê hilbijartinê wek katibê yekemîn yê Komîta Komsomola ya nawça Hecî-Xelîlê. Salên 30-î Cerdoyê Genco rêdaktorê rojname Rya teze hû. Rojnamêda ewê kurteçîrokê xwe dida weşanê, bavê min dîgo: "Cerdo rojname dixemiland... Sed heyf, kes nivîsarên wî nebiî xweyî, berev nekir..." Tevî bavê min salên zor û zextê Stalîniyê hatibû girtinê, kiribûne hebixanê bona karên "eksîşorişvaniyê" u pey salekêra ew jî afu kiribûn. 32

Azadiyêda çend meha admînîstratorê têatira nîşandana kînofîlma bû, ya ser navê "Moskva". Hema fîlmên teze distandin, ewî dê û bavê miiu-a digot: -Bira berxikê min bêne fîlma teze temaşekin. Û ez û xûşka xwe kubar-kubar diçûn û apê Cerdo, ku tim bi berçevk tê bîra min, bê bilêt, ciyê lapî başda em didane runiştandinê. Cerdoyê Gêncî paşê, ji payîza sala 1939-a heta sala 1945-a bû serokê Têatira kmdaye dewletê ya gimdê Elegezê. Têatira Elegezêye dewletê. ji milê rastê, yê 2-a Cerdoyê Gêncî, Nado Maxmtîdov..., pişt wan Hecîyê Cindî sekiniye. Belê, yekê gulana sala 1945-a, hogirê bavê meyî nêzîk, nivîskarê naskirî, Cerdoyê Gêncî 41 saliya xweda, hê di benga xwe ya berhemdariyê ya xweş da, xatirê xwe ji cîhanê xwest. Birê wî- Şikoyê Gêncî, jina xweva ji bajarê Livovê hatibûne hewariyê, Tezoya xûşka wî jî ji gundê Şamîramê hatibû. Diya min gilî dikir, digo: "Min besa mirina Cerdoyê bira gundê Şamîramêda bihîst û ez çend roja kerr digiiyam, zef ber xwe diketim. Gundiya dipirsî: -Xûşkê, Cerdo kî te bû? Min digot: -Gundiyê Hecî bû, mera weke bira bû... Ez û Cerdo êtîmxana bajarê Aştarakêda mezin bûne. . . Heyşt rojê din şerrê cîhanêyî duyemîn kuta bû. Bavê min hersal, 2-ê gulanê diçû ser mezê apê Cerdo û paşwextiyê usa jî ser mezê apê Emîn û Hiraçya Koçar {hersêkjî goristana Yêrêvanêya "ToxmaxgeF'-ê hatine defin kirinê). 33 Ez sala 1942 dibistana mûzîkayêda hatime qebial kirinê, beşa kemanê da. De pirs didane min, min bersiva wan dida u gotin, wekî ez tême qebul kirinê, ji ber ku merîfeta min di dereca mûzîkayêda heye. Bavê min pirr dilşa bûbû, ewî zef dixwest, wekî awazên stiranên gelerî bi nota bêne nivîsarê, neyêne unda kirinê. Divek wê demê hêviya wî ez bûme? Lê ez bê dilê xwe diçûme dersê mûzîkayê. Xûşkên min Zînê û Nûrê biçûk

bûn, dayîka min gav û sehet wanava mijûl bû, kesî guh nedida dersê min û ez jî bêhewas dersê mûzîkayêva "mijûl" dibûm û çend mehê din gazî bavê min kirin, gotin: -Hewaskariya siste... keça we ber bi mûzîkayê tune, dersê xwe da Ê sala xwendinê hê tamam nebûyî ji dibistana mûzîkayê berî min dan. . . û ez usa ji mûzîkayê aza bûm. Bavê min kêleka min rûnişt bi dengekî nimiz go: -Qîza min, tu dersê xwe hazir nakî, ya te pê girtiye ne pake, usa nabe, lier kes gere karê xweva mijûl be, ji hevala nemîne, xwendina xwedapêşbe... Ê, bîra min tê çawa ez berxwe ketim. . . Min xwe neheq hesab fikir, weki usa qewimî, wekî dê û bavê min ji min nerazîne, wekî ji hevalê xwe paş ketim, wekî ji dibistana mûzîkayê berî min dan. . . Ez birime dibistana rex mala me, ya Yêrêvanêye hejmar 5-a ser navê H. Hakobyan, ya eiTneni. Ê dibistana nû da min her teherî dixwest, wekî xwendinêda pêş bim. Ê îda min jî serê xwe kire ber xwe û xwend... Welle, ida xwendinêda tim pirr peş bûme. Bavê min her car diçû dibistanê civîna dê û bava, dihat digot: -Emirê razîme... te direj be, lawo, tu me rûspî dikî, ez zef keça xwe O,. . . ez çawa dilşa dibûm, hê diketime xîretê. . .

Paşwextiye, dersxana 6-ada dê û bavê min minra akardion kirîn u ez bi hewas diçûm koma akardîonîsta, ku dibistana meda amade kiribun u min zef baş akardionê dixist. \*\*\* Havîna sala 1946-a bû. Ecoyê kurê xatiya bavê mine Kidê bi mevanî hatibû mala bavê min {navê wîEcem bû, digotin Eco). Ewî go: -Hecî, dixwezî keçeke xwe bi minra dayîne, ez wêya ji vê germê 34 derxim, bivime gund. Guhê min ser xeberdana wan bû. Ez quloz bûm, min go: -Bavo, ez dixwezim tevî Eco herime gund, bal xatiya Kidê {Eco emirda mezin bû, le min timjêra digo-Eco). Ê ez çûm. Sibetirê, şebeqê em ji malê derketin. Bi avtobûsê em hatin Axbaranê, paşê avtobûsek dinda



hatin heta Elegezê. Eco go: - Wextêda em hatin, naka Şalîkoyê erebeçî, Şalîkoyê Eşo, wê me erebê siyarke û emê herine gund. Ewî minra gotibû, wekî gayê kolxozê erbêva girêdayîne u Şaliko her sibe bi wê erebê şîrê kolxozê Pampê tîne Elegezê, teslîmî fabrîka şîr dike û vedigere gund, go: "Wexte, wê naka bê virra here gund". Rastî jî, çend deqê din Şalîko hat, çend bîdonên şîr yê vala erbêda bûn, ewana dan alîkî û em erbê siyar bûn û berê xwe dan Pampa Kurda. Roje ewrayî bû. Eco go: - Dive bibare? Şalîko go: - Çi bêjim? Ez jî dilê xweda divêm: "Pî... ê ne digotin ji Elegezê heta Pampê dupa peya diçin-tên, lê ew çawane- awqa dûrî hevin?.." û hey ewira dinherîm û min nedixwest, ku baran bê. Bi hewaskarîke mezin, şabûyî min li wan çiya-baniya, wan çayîra û kulîlkên reng-rengî dinherî û xwe xwera digot: dibêje: " Tebiyet û hewa Pampê cinete". "Bavê min rast Em gihîştine Pampê. Min xatiya Kidê, kurêd wê Egît, Mehmed Yerêvanê da dîtibûn. Ewana zef baş ez qebûl kirim. . . Xatiya bavê min Kida Tvo yeke pirr dilovan, karkir û pirr xîret bû.Şevda hişyar dibu: pez,dewar didot, dew dikila, xebata malê dikir û ez tim ji bîna dûyê tendûrê hişyar dibûm (ez xênîda radizam). Ewê rihetî nedida min jî, digo: "Ca kişteke malê xe (nava malê gêzîke), ca çawa bade, ca serê pêz bigire, ca nanê pala tev keçika bive, ca tepika lêxe, ca tevî keçika here pincarê...." Tenê êvara, pey hatina garanêra "!" I em, zarê mehîlê, aza dibûn, berev dibûn u me dilist. Çevgirtinok zef li min xweş dihat. De em carina diketin nava kerdiyê kartola jî -me xwe vedişart. Rokê hişyar bûm, min dî xatiya Kidê digirî... divê: "Hecî, bira xatiya te korbe, dinêda nemîne... hela dinya çawa neheqe, kafîre, bê xwedê, pitê Hecî kê m bûn, te yek jî dayêda?" Min pakî fem nedikir, 35 derheqa çida divê û ûsa dikewgire... Paşê minra

gotin: "Zeynevê qîzek jî aniye. . .", ez jî çûm pişt tewilê rûniştim û giryam. . . Erê, ew meha tebaxa sala 1 946-a bû, Naza xûşka min hatibû dinê. Paşwextiyê diya min gilî dikir, digo: " Jina filankesê («ave wê nedigot) gotibû, kî mizgîniyê minra bîne, bêje - Zeynevê qîz aniye, mizgînya wê ser çevê min. . . De her wexta jî merivên kiret hebûne". îja me ji dayîka xwe dipirsî: -Lê bavo zef berxwe diket? Digo: -Na, lawo, na! Digot - dayîna xwedêye. Divek dilê xweda berxwe diket, lê tu wexta eyan nekitye, minra timê baş, heyf û helal bûye,. De Hecî, bi xwedêva eyane, qîzê xwe zef hiz dikir,- anî bêra xwe, go, - carekê Zîna me nexweş bû, germa wê zef bû. Bavê we zef berxwe diket. Vardanûşa cînar bi laqirdî go: - Hacî can, çira usa berxwe dikevî, şikir qîzên te zefin. . . We bidîta bavê we çawa hêrs ket, derê oda me vekir, go: - Na, min tirê tu cînareke heyfî... kerema xwe ji oda me derê, ez naxwezim te bivînim. . . Paşê ewê pêşkêşeke mezin bona Zîna me kirî, anî dayêda, usa bavê wera li hev hat, go: - Hecî can, qet laqirdiya jî fem nakî? Bavê we go: -Tenê ne laqirdiyên usa! XEZAL Payîza sala 1 946-a eskerê birîndar anîbûn Hospîtalên Yêrêvanê. Hospîtalek nêzîkî dibistana me bû, ser soqaqa Amîryanê. U mehê carekê-duda zarrê dibistana me dibirine wira, weki em wan bhîndara mijûl kin, konsertê çûk nîşanî wan kin. Ewana oda mezinda berev dibûn û me wanara kilam digotin û direqisîn, me helbest dixwendin... Carekê kete guhê min, wekî ji oda kêlekê yekî birîndar bi kurdî hema usa dibêje: "Ax, xwezil...". Wexta emê vegeryana malê, ez zivirîm wê odê, nêzîkî wî birîndarî bûm û min go: - Apo, tu çira dibêjî "Ax, xwezil?.." Ewî çevê xwe neyîseyî vekir, go : -Tu keça kêyî? Min go:- Keça Hecîyê Cindîme. Bi hêrs phîsî: - Hecîyê Cindî çûye ber şêr? 36 Min medê xwe kir, hêrs bûm û ew

bû ezê ji odê derketama, lê ez mam û bi xeyîd jêra go: - Na, bavê min nebirine şêrr, apê min şerrda hatiye kuştinê. Bavê min nebirine, çim ku destê wî...,- hê xeber devê minda, ewî go: -Na, welle, tuyê birê xwe bibaxşînî...xûşka mine biçûk, ez cama bê hemdî xwe hers dibim û pirsê neheq dibêm,- ewî bi beşereke xweş li min nihêrî û ez jî pêra beşerxweş bûm,- paşê zêdekir,- xûşka mine biçûk, ez navêjim "Ax, xwezil", ez divêjim: "Ax, Xezal..." Xezal dergîstiya min bû, payîza sala 1941-ê wê dewata me bûya...Ne bi xêr şerr dest pê bû, ez birim şêrr. Nava van salada 4-5 cara ewê bersîva namê min daye. Eva du mehe ez anîme Yêrêvanê, lingêkî min birrîne. . . Min kurapê xwera caw kir, wekî pê bihese Xezalê mêr kirye, yan na? Min go, heger mêr nekiryê, cawke bira ser minda bê. Caw kiribû. Bîstek berê ew, dê û xiişka xweye biçûkva hatin ser minda... Disa ew biî, ew Xezala mine şermoke, nazik, xaşik... Xasiya min xwe avîte pêsîra min, girya, go, wekî malxwe wê ji şêrr venegeryaye û herdu êtîm mane stûyê wêda. . . Lezekî dinê xasiya min ji odê derket, min destên Xezala xwe paç kirin... Xasiya min vegeiya oda nexweşxanê, wana xatirê xwe ji min xwestin, gotin 2-3 rojê din wê dîsa ser minda bên. Bîst roje ez hîvyême, tunene... Kurapê min wê îro-sivê bê, min ji nexweşxanê derdixin, hela bê wê beseke çawa ji minra bîne?. . . Ax, Xezal . . . Min başbe. . . go:- Apo can, bêhna xwe fireke, ewê bên, her tişt wê Ez bi dilêş hatim malê, min derheqa Rostemda (navê wî Rostem bû) gilî kir. Bavê min go: -Ezê sibê tevî diya te herin dîtina wî, hela çawa dikarin alî wî camêrî bikin?.. Sibetirê ez ji dibistanê hatim malê, diya min go: -Vê sibê ez û Hecî em çûne hospîtalê, doxtirê wî mera got, wekî kurapê wî duh nîvro hatiye û ew birye mala xwe Tibîlîsiyê, çimkî gundda kesî Rostem nemaye...bav û bira şerrda

bûne şehîd, dayîka wan jî ji birçîbûnê û kerbî malxwê xwe û herdu kurê xwe ruhê xwe daye....Mera gotin, wekî mala xasiya wîda eva çendeke kes najî, ji gund koç kirine, çiiine. . . Ez giryam, min go:- Çawa çûne?..'.. Çawa serda nehatine, çawa Xezalê Rostem tenê hiştiye?" Diya min ber dilê minda hat, go: 37 - La-lawo, serê Hîtlêrda reş be, şerre... lingêkî mêrik tunebû, diya Xezalê heyfa xwe, gunê xwe keça xwe aniyê, bona wê yekê jî qîza xwe ji gund derxistiye, ew hêsîr kî zane naka kune? Boy Xwedê be, qîza min, tu neke gunê dayîka wê û Xezalê. . . Lê min demeke dirêj Rostemê birîndar û xeberdana wî bîr nedikir, dihat... heyfa min wî, Xezala nenase delal... û diya wêye hêsîr \*\*\* Salêd şêrr û çend sala jî du sêrr ra, havîna, wezaretaxwendinê ya sovêtiyê dayîka min Ermenîstana dişand gundên kurda, dera baxçê zarra ewê li wan dibû vedikir, terbetdara wan. De salên şêrda mêr gundda kêmbûn, dupa jin diçûne kolxozada (şirîtekên Ez gundê Pampê da ser akardîonê gundiyan da) dixebitîn, zarokê xwe jî cem dayîka me dihiştin. bona zaroka miqamê kurdî lê dixim. Çiyayê Qemer dax tê xanê. S.1948. Dayîka dibirin gund. me em jî bi xwera \*\*\* Salekê havînê em odeke mala Êsivê Hesên da diman. Apê Êsiv tevî kevaniya xwe meta Seyran tenê diman, hevra zef heyf bûn. Gerdena keça wan biika xatiya Kidê bû. Serê pezê nîvro tim min digirt. Carekê ez ne mal bûm, tevî zara dilîst. Pezê nîvro tê, meta Seyran derdikeve ser şoşê û gazî min dike "Firîde. . . , ha Firide". Min dengê wê bihîst, min dûrva go: - Meta Seyran..., Firîce maldane, bira îro ew serê pêz bigire. - Pî..., go,- ê ne heyfa Firîcêye... qîza min, de tu were, zû were, derenge, pezê here. . . De heta gundda jî xelqê maqûlya Fhîcê, nazikaya Firîcê texmîn dikirîn. Ewê sibe-sibe gişkara digo: "Sibe xêra we", berî razanê diçû bal

wan- apê Ûsivra, meta Seyranra digo: "Şewa we bimîne xweş" ...  
Diya min digo: -Maqûliyê, Firîce bavê xwe çûye. 38 PELA DUDA  
Salên 1948-1950 dîsa bajêrda meriv digirtin, sirgûn dikirin. Avayê  
doktorê zanînên fîlolojiyê Ararat Xarîbyanê ermenî rex mala me  
hû. Şevê hatibûn baltûza wî, mêrê wêra sirgûn kin. Baltûz wê  
lezê xwe ta dike, jerê dixwe, li wir dimire, lê mêrê wê divin. . .  
Zulmbu... Bavê min pirr xemgîn bû. Diya me mera digot; - Şev xew  
nakeve çevê Hecî, divê "Wê dîsa min têkine hebisxanê, yanê jî wê  
me malêva sirgûn kin". . . Min zanibî, wekî roja girtina bave me -  
18 adara salal938-a, wexta polîs bona dîtina îzbatan navmala me  
serobinî kiribûn tenê hejmareke kovara Hewarê ya 24-a dîtibûn, lê  
hijmarên din, ku diya min nava sova dîwêrda, bin êzingada  
weşartibûn, wana neditibû (her sal 15-e meha adarê mala bavê  
min îda sove venedixistin û darê ku ber diman dildrine nava wê  
sovê. Girtina bavê min jî pey 15-e adarê bû). Belê, çend nemên  
Celadêt Bedirxan, çend kovarê Hewarê û usa jî çend nemên din  
mala ineda hersal usa dihatine weşartinê. Lê wexta ev pêla duda  
destpê bû, gava merivê amûtam dîsa digirtin, sirgiin dikirin,  
rihetiya bavê min tunebû. Destê wî nediçû wan tiştê bavêje,  
bişewitîne, dayîka me jî newêrbû hêrsa bavê me rake. Rokê ez  
çûbûm dersê. Mamosta me çend zarok şandin mala Roza hevala  
me, wekî pê bihesin, ka Roza çira nehatiye dibistanê. Ez jî wanara  
çûbûm. Cînara wan dizîkava, kelogirî mera go: "Birin, şev malêva  
sirgiin kirin, birin". . . Ez pey dersara hatim malê, min diya xwera  
got: - Mala Roza hevala min jî sirgûn kirine. Hela hê bavo ne male,  
bîne em wan kaxeza bişewitînin. Go;- Destê min naçê. Min go:-  
Elbeke xihnet bide min, eze derêm balkonê (hewşê), wana  
bişewitînim. Min ew kaxez kirin elbê, agir berdayê. Dayîka min bi

çevên hêsir hey derê balkonê vedikir, digo: "Zû bikel", hey digo; "Bavê teyê çi bêje?", hey digo: "Usa bike te nebînin". Em taqê çarada diman, de dîsa hevsa xwe dikir - "Xelq tişteki texmîn neke?" Berî êvarê, pey xarina şivêra bavo go: -Hun çi ji min vedişêrin, hun çi qewî usa kerr ii lalin? Derew kirin, derew gotin mala bavê minda tu demê tunebiye. U 39 diya min bavê minra gilî kir, go: -Min ew name, kovar dan Firîdê, Fîridê hewşêda şewitand. . . Bavê min melîl bîx. . . lê piştî lezekî go: -Ax, sed heyf. . ., welle, emir çiqas çetine...ez çi bêjim? Na, ne gunê we bûye... Lê, çendek bû beşera bavê min qet xweş nedibû, pirr melîl û xemgînû... \*\*\* Dayîka Vardanûşa cînara me ji Tibîlîsiyê bij, me jêra digo- babo (bi gurcîkî: pîî^kê). Hersal 2-3 cara dihate Yêrêvanê. Xwexwe terzî bû. U her car diya minra digo: -De hela bîne were, emê kincê kîjan keça te bona kîjanê kinkin, biguhêzin, bidiriin, (dêrê Firîcê bona min didriitin, yên min bona Zînê. . .). Kincê Firîcê û Niirê gere tim xas bûna, dayîka me digot: - Firîce dibistana rusada dixûne, lê Nûrê dibistana mûzîkayêda- û hûn gere wê yekê fem bikin, wekî ew herdu dibistan jî ji başqetirin, gere kincê wana xas bin. Diya Vardanîişê digo: yên we -Diçim Tiflîsê cînarê xwera her car besa mala we dikim, divê m nava du odada hevt neferin û heyran, qet dengê wana nayê, her yek ker îî lal karê xweva mijîle, û çiq mêvana qebiil dikin, verê dikin. . . Hecî îî bermaliya wî Zeynev zef alî hewcekara dikin. . . Salên 50-î Nîvê salên pêncîyî dîsa ocaxên kurdiye çandî, zanyarî li komara Ermenîstanê vebîin. Li peytextê komara Ermenîstanê, li ku salên li Yêrêvanê, ii 1956 dîsa rojnama "Rya teze" hate weşandinê, 1955 Hecîyê Cindî wek katibê berpirsiyar kar dike. Bona rojnamavanêd ciwan ew ii Emînê Evdal dibine wek mamoste. Hema ermeniyaye

wê salê jî Xwendinxana kurdî pêdagogîyêda beşa vedibe. Hecîyê Cindî wê derê dersê zimanê kurdî îî edebyeta kurdî dide. Hec îyê Cindî wexta ders dayînê, s. 1958 40 \$; AFXMBEAñOnFABKA , Ş^y |;;v .yifiimmfm Efupo lHi lin-AfaKBBH ot 7.-7 S "îîBftpjî Î955,r, ^jş^a^A^^, Kê dokûmanêda tê gotinê, weJd bi biry^ara byûroya komîtêya navendîya Partiya Komûnîstiyêye Ermenîstanê ya 7-8 meha ciîle sala î955-a Cawarî Hecîyê Cindî hatiye kifş kirinê wek katibê berpirsyar û endemê rêdaksiona rojnama "Rya teze ". Hecîyê havînê kîirsên Cindî hersal mehên di temamkirina da, ku zanebîinên wezareta : «»: , rsm.töMyi4:ijeW(\*t^f^tK mamostan Ermenîsyanêye ronkayê vedikirin, ji ştatê der, dersên ziman îî wmi'iwmaştf: iiii edebiyeta kurdî didan. Sala 1955-a Hecîyê Cindî bona karê xweyî berbiçev di dereca kurdzaniyêda bi Ordêna "Nîşana Hurmetê"-va tê rewakirinê. \*\*\* Sala 1959-a anegorî biryara sedirtiya Akademiya Ermenîstanêye zaniyariyê Hêcîyê Cindî ji înstîtiita edebiyetêye ser navê M. Abêxyan cîguhêzî sêktora rojhilatziyê dibe, li wir dibe serokê beşa kurdzaniyê. BAL ÎSAHAKYAN Sala 1954 -a bîi. Rojêke havînê bavê min hate malê, go: -Van roja emê fotoyê xwe tevî Avêtîk îsahakyan bikşînin. - Em kî?- me ji bavê xwe pirsî. - Firîde. Ez ii herdu qîzê xwe- Firice û - Ê ne fotoyê te tevî Varpêt hene?- diya min gotê. 41 - îjar ci, wekî hene?... îro mala nivîskarada rastî Varpêt hatim (Avêtîk îsahakyanra cama digotin -Vaipêt, yan Hoste). Min jêra got: "Varpêt, bona bi miinesebeta 80 saliya jidayîkbîina te, min bi hizkirineke mezin çend berhemên te wergerandine ser zimanê kiirdî. Ewê bi berevokêke cuda bi semavê "Emoyê kurmanc" sala tê bê weşandinê". Varpêt kêfxweş bii, razîbûna xwe da min. Paşê min zêde kir, gotê, wekî dixwezim fotoyê wî jî wê berevokêda

hebe. Min jê pirsî: -Ez li fotoçêkir dikarin bêne mala we, fotoyê te bikşînin? -Ew çi gilîne?-got,- keremkin, werin, ese werin, ezê hîviya webim. . . neferava werin. Wê êvarê kurê hevalê bavê minî nêzîk, kurê Cerdoyê Gêncô- Lyova bi mêvanî hatibîi mala me. Bavê min wîra jî got: -Hergê xwestina te heye, fîlan rojê, filan sehetê baxçê pêşberî avayê Opêrayê hîviya mebe, emê hevra herin mala Avêtîk îsahakyan, fotoyê xwe tevî wî bikşînin. Ez ii xûşka min Firîce bêsebir hîviya wê rojê bîin. Ne axir emê rastî lawê gelê ermeniyayî mezin bihatana, helbestvanê dinêeyan. . . Wedê kivşkirî em çîin mala îsahakyan. Jineke cahil derî ber me vekirîgo: -Varpêt hîviya weye. Em çîine hundurê malê. -Keremkin, keremkin,- dengê varpêt ji oda peşber hat îi em çîine wira. Bavê min nasiya me da Varpêt, got, wekî qîza wîye mezin-Firîce, xwendikara înstîtîita doxtiriyêye, Firide-xwendikara înstîtîita dewletê ya pêdagogiyêye li bajarê Moskvayê, lê ew xort- Lyova, kurê nivîskarê meyî navdarî rehmetî Cerdoyê Gêncoye, xwendikarê înstîtûta êkonomîkiyêye li bajarê Livovê. îsahakyan mera kêfxweş bii, ewî go: -Ez zef şame, Hecî can, min gelê we ziida hiz kirye,- îi ji emirê kurmancê dîtî anîbîr... Gilî kir, wekî gondê wanda aşê wan hebîiye. Zarotiyêda jî ew li wêderê rasti gilî-gotinê wan, Ji çepê Firîde Av hahak) an, Firîce, Lyova kurmanca hatiye, kilara ii miqamê wan bîhîstine. Gilî kii derheqa şivanên gundê xweda: 42 -Mexso biliirvanekî hêle bîi, Haso dengbêjekî bi gotina te...,- zef cara li wana qesidîme, bi dil îi hizkirin kilam îi miqamê wana bihîstiye, helalî îi paqijiya mhiyeta wan texmîn kirye... îsahakyan wî çaxîda folkilora me hiz kirye, berhemên xweda jî folkilora kurdaye dewlemend daye karanîne... Em derketin balkonê. Şikilkêş bona berevokê fotoyê Varpêt kişand, paşê fotoyê Varpêt îi bavê min, paşê jî fotoyê varpêt û me



xwendevana. -Hecî,- Varpêt got,- qe Qers tê bîra te? -Na, Qers pakî nayê bîra min,-bavê min bersîva wî da,- ez li bavê xwe Cindî çend cara çîine Qersê kîrrîn - firotanê, lê gundê me, gundê Emençayîrê, ku nêzîkî Qersê bîi, rind tê bîra min: ew çiya, ew çayir- çîman, mala me, malêd kalikêd min, ew kanî. . . Varpêt go: - Qers ne dîire, ji aliyê Gumriyêva lap nêzîke... Hecî, xwezila rê vebîina, ez îi tu em biçîina Qersê. . . Bavê min bi hisreteke mezin gotê: -Xewzil, Varpêt can, xwezil. . . Dema em ji balkonê hatine hundurê malê, kulfeta îsahakyan- Sofiya xanim, berbi me hat, got: -Keremkin rîinên, qawe hazire... Em rûniştin, kulfeta cahil qawe ii totikên şîrin danîn ser texte. Sofiya xanim jî rex me riinişt. Ewê ji bavê min pirsî: -Hecî can, çend zarê te hene? Bavê min got: -Pênc qîzê min hene! -Xwedê wana xweyke, wan gişka xweyke. . . Bavê min go:-Sofiya xanim, ez zef ji we razîme, bira xwedê kurê we Vîgên jî xweyke, mirazê we wîbe. . . Paşê derheqa wergerêda xeber dan. . . îsahakyan pirsî: - Hecîyê pismam, kerema xwe bêje, gelo berevoka nîi da te qe çi werger bi cî kirine? Bavê min go:- "Emoyê kurmanc", "Nadoyê bengf", "Leyl û Mecriim", "Diya minra". "Gundî îi çivîk"... Varpêt giliyê bavê min nîvcîda hişt îi jê pirsî: -"Lê Ebû li ale Maharî?" Bavê min go:- Na xêr. "Ebîi li ale Maharf' cewahireke, wergera wê destanê çetine, min bona vê berevokê pêra negîhand. - Bellê, çetine, ezî 34 salî bûm, wextamin ew destan nivîsî... 43 Av. îsahakyan ji me pirsî, gelo em efrandinên wî zanin? -Çawa nizanin,- min ziizka gotê, ez ji ciyê xwe rabîim îi helbesta wîye "Elegezêra" zarkî got. Gişka destê xwe minra lev xistin. Zeman difirî, ew du-sê sehet bii em wir bûn, lê me tirê çend deqe derbaz biine. Lê îdî wext bû. Em rabûn, bavê min razîbîina xwe bona wê rasthatina hewaskar, fotokişandinê îi teglîf

kirinê gotê, me xatirê xwe ji Varpêt îî kulfeta wîye mêvanhiz xwest û bi dilekî baristan îî şa ji mala Avêtîk îsahakyan derketin. . .

...Rojnîşa xweda 21-ê sibata sala 1959-a bavê min nivîsiye: "Iro min guhdarya welgerê Fêrîkê Ûsiv kir ya "Ebû li ale Maharî".Eferim Fêrîkra! Hergê Varpêt hebîiya, minê jêra bigota: "Varpêt, ew destan bi hostatîke mezinva hatiye wergerandin ser zimanê kurdî bi qelema şayîrê 25 salî Fêrîkê Ûsiv". Lê heyf, eva sala dudane îsahakyanê mezin xatirê xwe ji cîhanê xwestiye..." \*\*\* Hecîyê Cindî salên 1932-a îî 1933-a tevî êkspêdîsîya berevkirina zargotina ermeniya li kurda dibe. Aha akadêmîk Aram Xanalanyan çi dinivîse: "Weke sî sala min îî Hecîyê Cindî salên tev kar 1930-î kirye. Destpêbûna tevî Hecîyê Cindî tevî dostên xwe, folklorîstên ermeniya yê mezin tevayî êkspêdîsîyayêd zargotinê bîine, ku bi serkariya Karo Mêlîk-Ohancanyanê emekdar hatine teşkîlkirinê. Gele Karo Mêlîk-Ohancanyan gundêd Ermenîstanê geryane, gele (rûniştiye) û Aram Xanalanyan, s. 1957. qînyatên zargotinê berev kirine..." Salên 50-î soqaqa meda kurdê me timê qatix (mast) danîn difrotin. Cama dayîka min jî ji wana dikirî. Yekî bi simêl, navê wî 44 Eslan bîi, soqaqa Sverdilovêda tim dikhe gazi: " Masîin, lav masîin, ararat masûn". Cinarê me,ku zaniyarê ermeniyî eyan bîi - Ararat Xarîbyan, qatix jê dikirî, jêra digot: "Barêkam, mî asa ararat masun, asa anarat masun" {pismam, nevêje ararat qatix, beje-qatixe temiz). Usa diqewimî Eslanê qatixfiroş dayîka minra digot: "Xîişkê, îro şîrê me bîsoyî bîibîi, ezê sibê qatixê temiz wera bînim". Sala 1 956-a Firica xîişk înstîtiita doxtiriyê kuta kir îî hema havîna wê salê jî dewata Firîcê u Şekro kirin. Rokê, pey dewatêra, Eslan derê me xist, qatix anîbîi, diya min jê kirî. Piştira ewî go: - Xûşkê, dibên we qîza xwe bê qelen daye mêr, lê hinek jî dibên: "Hecî

qelen dizîkava stendiye, gotiye: "Kesîra nevêjin", gelo raste? Diya min jêra go: -Welle, me qîza xwe bê qelen daye. Va, Hecî male, were jê pirske. Go: - Na, na xîşkê can, ez bawer dikim, de bera xelq jî xwera xeberde. Bavê min derheqa vê xeberdanêda pê hisya, go: -Min qîza xwe bê qelen daye mêr, ezê qîzê dinê jî bê qelen bidime mêr. Qîz, gotî neçilmisin... Ax, xwezil, sed car xazil, ew edetê gelê meyî zîrar îî paşdamayî tamam ji navê bihata rakirinê...Lê, çi ku ma derheqa wan xeberdana da, de bira bêjin, guh nedinê. . . Salên 60-î Ez divê sala 1 961 -ê bîi, Xatiya min Zevo bi mêvanî hatibî mala me. Bavê min pey xebatê westiyayî, kesirî hate mal.Xatiya Zevo bi xemgînê jê pirsî: -Hecî can, tu timê wa kesirî têyî malê? Bavê min go:- Na, Zevo can, iro civin bii. Merivê usa hene hergav hersa min radikin, pey min ketine... -Pî. . . Hecî can,- xatiya min gotê,- te jî yanê tişt go? Xelq bikeve pêşiya meriya - rinde, yan pey meriya? Heyran, xwedê kirî ketine pey te, neketine pêşiya te. . .De bira usa pey te kevin îî negihîjine te. . . Bû pîrqîna gişka, em kenyan. . . . Bavê min go: -De bira gotina te be, xîşkê can, xemê min revîn, bîna min derket. . . 45 \*\*\* Me malêda xebera "na" nedibhîst. Eger çiyînek, hatinek lazim dibîi, me ji dayîka xwe dipirsî îî ewê hercar digo: -Ji bavê xwe pirs kin. Bavê me wê guh bida me u eger bigota "aqilê min nabire" îda xilas, me gere dengê xwe nekira îî karê xwe dinêva mijîil bîina, yanê wexta me digot " ew gilî, yan çiyîn lazime", ewî digot: " Min serwext kin bona çiyê?" Mala meda hevfermkin, hizkin îî girtina qedirê mezina hebîi. Me ber çevê xwe didît xebathizî îî xêrxaziya dê ii bavê xwe. Me timê derheqa dersên xweda, piştra karên xweda, pêşdaçiyîin îî çetlnayên xweda wanara gilî fikir, wana dişewirîn, me gilî-gotinên dê û bavê xwe ser çevê xwe qebîil fikir. \*\*\*

Dibistana ku min salên dirêj wek mamosta dersên matêmatîkayê bîim, orta mala bavê min îî ya min da bîi. Dê îî bavê min digotin: - Berî çiyîna mala xwe, pey karê xwera, ji dibistanê were serîkî bide me, paşê here mala xwe. Rokê ez hatim mala bavê xwe, bavê min hazirya xwe didît, ku ciyada here. Go: - Ez îro neçîime ser karê xwe, dersbêjekîra pev ketime, ku bona xortekî xwendekar pêra xeberdim. Nişkêva dayîka min biênijî. . . Bavê min ker ii lal potê xwe êxist, go: -Ez ciyada naçim. Min go:- Bavo, çawa naçî? Ê ne te go- pev ketiyî, naka mêrikê bendatebe... Go:- Naçim, sebir hat, - ii me xwe kerr kir. 10-15 deqê din bermaliya mêrik bavê minra bi têlêfonê axivî, ji navê mêrê xwe baxşandin ji bavê min xwest, go, wekî mêvanê wan hebûne, piştira wan mêvana mêrê wê birine gund. Şa bîi, wekî bavê min hê ji malê demeketibii. Diya min go: - Pak bîi, vê surr îî sermê Hecî neçîi hîviya mêrik nese kinî. Hecîyê Cindî yekî usa bîi, "sebir" ê jî bawer dikir. 46 Meha adarê sala 1864-a me têlêgram ji Sêda Riidênkoyê sitend: "Ez bi dil doktorê zaniyariyê kurdî pêşin bimbarek dikim." Derheqa biryara Komîsiya atêstasiyone here bilind li Moskvayê Sêda Riidênkoyê em agahdar kirin. Bavê me bê xweykirina dîsêrtasiyê bîi doktorê dereca duyemîn. "Lîtêratûmaya gazêta"yêda (rojnama edebiyetê, Moskva) 12-ê hezîrana sala 1965-a ev foto hatibîi cî kirinê ii bin wîda nivîsî bîin: "Malbata Hecîyê Cindî Cewarî: navê doktorê zaniyariyê sitend". kurdê pêşin Sovêtistanêda, ku Ji çepê: Zîne, Zeyneva Ivo, Nazê, Nûrê, Hecîyê Cindî Firîde, Firîce. Payîza sala 1964-a, 22-ê meha îlonê Emînê Evdal - hogirê Hecîyê Cindî, zanyar, pêşewitîyê nivîskar, canda mamosta kurda, - pey nexweşiya dirêj ii giranra xatirê xwe ji cîhanê xwest. Me bavê xwe awqa berxweketî, dilşikestî serriyê nedîtibii. xwe Ewî pirr dirêj

digot: hilnedida, "Heyfa Emîn, hevalekî pirr helal bii, Hecîyê Cindî û Emînê Evdal borcnas, xîret..." Bavê min digot: "Hela li gundê Emençayîrê da me hevaltî hevra kirye. Ew du sala ji min mezintir bû. Min timê hurmeta Emîn girtiye, yekî helal bîi, paqîş, rastgo, karkir. Hevalên mine nêzîk, gundiye min 47 Cerdoyê Gêncê, Emînê Evdal, sed mixabin, zî çîine ser dilovaniya xwe". . . Bi xemxurya Hecîyê Cindî ew hate binaxkirinê li pantêyona Yêrêvanê, kîderê merivên navdar defin dikin, ewê her usa jî du pirtiikên apê Emîn pey wefatbûna wîra dane weşandinê. Sala 1966-a bavê min layîqî navê profêsoyîyê bii. Hecîyê Cindî ji sala mamostê ziman, edebiyet 1968 heta û 1974-a li Zanîngeha Yêrêvanê kurdî bii yê beşa fakiilteta folkilora rojhilatziyê ya Kurdzaniyê. Hecîyê Cindî û Şekro Mihoyî tevî .xwendkarên beşa kurdzaniyêye ya Prof.Hecîyê Cindîji xwendkarên beşa kurdzaniyê întiyamê hiltîne Zanîngeha Yêrêvanêye dewletê. Salên 70-î Sala 1970 Hecîyê Cindî bi mêdala "Bo xebata efat", bi miinesebeta 100 salya bîiyîna V. Lênîn, hate rewakirinê. Sala 1971-ê Nûra xîşk têza xwe bi semavê "Hunermendya stranên kurdaye geleri" li înstîtiita Hunermendyê ya Akadêmiya Ermenîstanê ya Zanîariyêda bi serfirazî ii yekdengî xwey kir u derca kandîdata (doktora) Hunermendyê stend. Sala 1972-a Hecîyê Cindî wek endam-miqaledarê Akadêmiya Kurda (îraq) tê hîlbijartinê. Hecîyê Cindî bi biryara Sedirtîya Şêvwa Ermenîstanêye tewrebilmd sala 1974-a hêjayî navê "Karkirê Ermenîstanêyî Zanîstiyêyî Emekdar"-î humietlî bîiye. 48 Hema wê salê jî bi biryara wezaretê Ermenîstanêye ronkayê ew bi mêdala ronakbîrê ermeniya X. Abovyan tê rewakirinê. Sala 1974-a Firîca xîşk dîsêrtasya xwe bi têma kardîyolojiyê bi serfu-yazî ii yekdengî xweykir ii bû doktora bijîşkyê. Bavê me sala 1975-a duyemîn tê

hilbijartinê çawa endemê (parlamênterê) şêwra bajarê Yêrêvanê.  
 Hecîyê Cindî bin vîfotoyî nivîsiye: 'Ez û dostên mine ezîz: Doktor.  
 profêsor Harûtyûn Mikrtçyan û doktor Sarîbêk Manûkyan, s. 1976.  
 " Sala 1976-a Hecîyê Cindî dinvîse: "Cabeke nebixêr hat gihîşte  
 me: kinêza me, kurdzana meşîi\ edebyetzan, zargotinzan, doktora  
 edebyetzaniyê Margarîta (Sêda) Riidênko wefat bii. . . Ewê bi  
 weşandina berhemên xwe nîşan da, ka sedsalên navînda  
 edebyeteke meye destnivîsare çawa hebîye. . . Eva yeka bûyerek  
 usa bîi, çawa meriv pêşiyêd xweye aqilbende xweykemal ii  
 merîfeta mezin ji xewa hingorî hişyar bike. . . .Margarîta  
 Borîsovna nayê bîrkinê. H Cindî tevî Sêda Rûdênkoyê s. 1960.  
 ]^^jq\i^ Wê nava îi gelê meda qenc nemirî navekî hiştiye. . ."  
 (rojnama "Rya teze"). 49 Bo 70 -salîya bûyînê û bo karê pir mezin  
 di dereca pêşdabirina kurdzaniyê ii edebyeta kurdî û  
 pêdagogiyêda Hecîyê Cindî sala 1978-a bi Ordêna "Dostaniya gela"  
 îi hurmetnama Akadêmiya Ermenîstanêye zanîstiyêva tê  
 rewakirinê. Bavê min rokê jî ji Teyoyê kurê xalê xwe, ku panzdeh  
 zarên wî hebûn, pu^sî: -Teyo maldanin? Teyo pirr laqirdçî bii, bi  
 ken go: -Apo can, ez ii bîika te em wana dijmêrin - yek, dudu,  
 sisê...,- paşê bû pîrqînya wî, radizên, lê go,- na, wele, apê xwera  
 bêjim, zarê çiiik zii can, berî razanê tu çawa zanî, wekî neferê te  
 hemiişk yên mezin xwexwe zanin kî pey kêrane ii berî razanê  
 elametiye didine me hela kî ne hatiye malê. . . Bavê min go:-  
 Teyoyê min, Xwedê zarê te xweyke! Zaru kulîlkên malêne. Teyo  
 go:- Zam xilamê teue, apo can. Salên 80-î Hecîyê Cindî sala 1985-a  
 bûye endam - hîmdarekî înstîtîta kurda ya Parîsêye şerefê. Sala  
 1986-a xelata rojnama "Rya teze"-ye mexsûs "Bona wergerandina  
 edebiyeta ermeniya ser zimanê kurdî" didine wî. Sala 1988-a, bo

80-salîya Şêwra bîiyînê, Hecîyê Cindî bi tê HURMETNAMA rewakirinê. Sedirtîya Ennenîstanêye tewrebilindva HATINA RIZA Xezal xatiya bavê min bîi, meta Fêrîkê Ûsiv...Wexta koçberbînê mêrê Xezalê rêva dikujin ii Hesenîkê Cemaldînî Xezalê ji xwera dike jin. Ew nawça Dîgorêda dimîne. . . . Hemoyê birê Fêrik wê bihata mala bavê min, wê nema çend gundê qeza Qersêra binvîsyana, bavê minê bibira bida wergerandinê ser 50 zimanê tirkî û bişanda, bi wê hêviyê, wekî dive caweke xêrê derheqa Xezalêda bê bigihîje wana. Dinvîsîn îi hêviya xwe nedibirîn... Û rokê cawek hat... Rizayê kurê Xezalê nivîsî bii... nivîsî bîi, wekî Xezal ji vê cîhana ronik çîiye, le ew bi xwe dive bê dîtina xala, xatiyê îi lawên xatiya. Şabiina, ku ji ber stendina wê namê ket nava neferê mala me bi peyîva nayê gotinê. Lê bavê min bona Xezala xatiya xwe ber xwe diket, digo: - Heyî wax, heyî wax,. . .xatî can, Xezala xîşk Zozana dê, xîşk dayîkamin... Bo xatirê Xezala diya xwe bi pirs-pirsyara nuxuriyê Xezalê - Riza, zivistana sala 1 978-a ji Tîirkîyê hate Ermenîstanê... Ewî gilî kir- çawa diya wî hertim destê wî digirt, îi ew dihatine ber avê-wî alî sînor, îi ewê dikire gazî, ji sînorçiya pirs xîşk-birê xwe dikir. Sereskerê sînorçiya kurd bii. Ewî bavê minra gilî kiribî derheqa wê jinka hêsîrda îi bavê min ew neheq dikir, wekî navê nefera jêra negotiye. Roj îi meh derbaz dibîin, deng îi his tunebîi, gişk bêsebir benda hatina Riza bîin. . .

IÊÊ'^'^J^^ n^ iPH -Rizatuyî?.. Û şeveke zivistanê bi têtêfonê mera gotin: - Bersîva mêvanê xwe yê ji Tîirkîyê bidin. Fêrik qiloz bîi, têtêfonêda kire gazî: - Fêrîk, ezim, ez bi qurban, xalên min qe çawanin?... Go:- Tu bêje kîjan hotêlêdanî, emê bèn xeberdin. Go:- Hotêla "Anf'yê dame. Fêrîk kincê xwe zîzka xwekir, go: -Biliv, emê herin hotêlê. Min go:- Sebirke, naka taksî jî tunene. . . Go: - Na,

Riza awqa erd hatiye, em nikarin peya herine hotêlê? Û em çûn...Rêva me xeber nedida, her yek me mitalada bii, îi me dilezand, wekî deqekê zii Riza bivînin... Dergevanê hotêlê mera go: -Hîviya wene, herine filan odê. Me derê wê odê xist, Riza derî vekir...îi çevê wan bi hêsir, wî ii Fêrîk hev hemêz kirin, hev bemedidan... Jina Riza- Gulê, jineke zarxweşe xaşik bîi. îske-îska me herda bîi dora wan diçîin, dihatin... Piştra ew riiniştin, îjar Fêrîk go ez kî me, îjar em çûne riîyên hev. Ez difikirîm : "Welle hisret çiqas zore..." 51 Riza derheqa xal îi xatiya xwe ji me pirsî, Fêrîk got: - Ew çîine nava ax û berê sar. . . Bîi kurîniya wî giriya. Go:- Ax, dayê, ez dereng hatim ditina xîi.şk îi birên te, wax.... Pey wefata dayîka xwe, min kire hişê xwe, wekî çawa jî hebe ezê werime Ermenîstanê, hema ez dewsa dayîka şîrin gere birê wê îi xîişkê bivînim...Ez dereng hatime, ax, Xezala dê, tu bibaxşîne kurê xwe... ax, dayê, dayê... de gidî, bextê weme, me zîi bighînin Pampê, ez dixwezim herim ser mezelên xîişk îi birayên dayîka xwe. . . Êdî berbang bû, em hatin mala bavê min, li wir jî ji şabiina giriyan. Bavê min digo: -Bera rema xwedê xatiya min be, bera ruhê xatiya min Xezalê ragihîje kesverê rem îi rihetiya heta-hetayê, - digot,- welle, ez îro pirr dilşame bona hatina Rizayê bira, Rizayê kurxati îi helala wî Gula xîişk,- digot,-hûn ji gundê Qizilqulê heta vira ser herdu çevê minra hatine. . . Fêrîk gundra bi têtêfonê birê xwera axivî, got: - Çevê we gişka ron, Riza, jina xweva hatine Yêrêvanê. Go:- Ser herdu çevê me, ser serê mera hatine, bi xêr hatine...welle, beriF zef ketiye, rê hatine girtinê, lê çawa jî hebe emê îro bi "Wîlîsa" Hemo bên. Hatin, êdî nîvro bîi, bavê min nehişt wê rojê rêkevin, sibetirê pey taştê ra rêketin. Birê Fêrîk gotin, wekî lawikê gund naka riya Pampê îi goristanê vekirine. Riza û Gula



helala wîye delale zarxweş çîine Pampê, îi Riza, çawa Fêrîkê Ûsiv destana xweye "Rizayê kurmef" da nivîsiye: Tevî xizm ii xiinavê gund Xwey-xîinavê dereng hatî Diçe pala çiyayê bilind- Ser mezelê xal îi xatî. . . Çenge xweliya mezelê xal Û mezelê Kida xatî, Dike nava dezmalala al Bi tiberkî, tulizmatî. Wekî bibe here wira Bu-eşîne bi şîn-şayî, Ser mezelê xîişka wane - Ax îi keser dilda mayî. . . Fêrîk gilî dikir: "Der îi cînar tamam hatin, hilşyan ser me îi her 52 kesî çevronayî dida me. Gişk di heyra Riza da bîin, digotin: "Ser çewara hatî, bi xêr hatî". Herro ewan mêvanê brakî min bîin, her dera bi def îi ziimêva kêf dikirin, govend digirtin, Riza ii Gulê jî dileşq diketingovendê..." Wezîrê Eşo bîranînên xwe da diniyîse: "Min temî li lawên apê Ûsivê îvo kir, ku ew Riza îi Gulê ji Pampê bibin Sipîtakê, dîtina birê min- Şîraliyê Eşo, ku li nexweşxana wî bajarî da serokê xîrûrgiyê bîi. Min dixwest, ku Şîraliyê weke min hisreta qersiyar da jî Riza îi jina wî bibîne, şa îi kêfxweş bibe. Yekê jî Gulê ji sehet, tunduristiya xwe digazinî. Min dixwest, ku Şîralî alîkariya wê bike. Lawika daxweza min bi cî anî bîin: Riza îi Gulê biribûn Sipîtakê mala Şîralî. Li wira Şîralî teseliya tunduristiya Gula bûk kiribîi, boxçekî mezin jêra dîi-derman danî bîin, ku piştî çîiyînê ew wana bixwe. Gava Riza îi Gulê ji Pampê vegeryan, Gula bîik her wa heyîra Şîralî da bîi, pesina wî dida îi digot: "Şîraliyê min mîre"... Berî çîiyîna xwe ya Romê, Riza û Gulê dageriyan Yêrêvanê, mala bavê min. Hatina Rizara bavê min pirr kefxweş bûbîi. Dayîka min paşwextiyê danî bîr: "Gava Riza, bermaliya wî lawikara çîine Pampê, Hecî nişkêva dudilî bû: Digot: "Gelo rastî Riza kurê xatîyê? dibe merivê xerîbe, tirka wîya "bona min şandine", (/7 ber ku Digot;- Hecîyê Cindîpê radiyoya Yêrêvanêye bi zimanê kurdî pir cara bo qetilyama û înkarkirina kurda dijî tirka xeber dida û

xênji wê, pey kela bolşêvîkraji meriva ha-hanga bawer nedikir, ê ne wê demê çûyîn-hatin jî pirr çetin bû -F. H). Lê wexta Riza ji Pampê vegeriya îî giliyên diya xwe - Xezalê, derheqa şewitandina lodê û diziyê îî derheqa mêrxasiya xatiya xweye Zozanêda gilî kir {ew çî ku Hecî zanibû), ewî teze ji wîya sed selef bawer kir û dîsa hatina wîra bêhed ii hesab şabû, û paşwextiyê pu- berxwe diket, wekî pêra negîhand fotoyê xwe tevî Riza bida kişandmê". Roja sisya em çîine hotelê, wekî Riza heq-hesavê hotelê bide, piştira bi avtoyên lawikên gundê Pampê rê ketin ber bi bajarê Gumriyê, wekî ji wir bi tîrenê herine Qersê. Li Gumriyê, dema xatirê xwe ji hev dkwazin, Riza bi dilşewat dibêje: -Qurbana we bim, ezê dîsa bêm dîtina we. . . Fêrîk gilî dikir: " Ew xeber bîin agir, dilê min şewitandin, wê deqê, nizanim çima, min tirê ezê îda Riza nevînim û min ziizka bi dezmalê hêsirê çevê xwe temiz kirin. . ." ...Belê, dewsa hatina Riza, me sala 1980-î namek sitend, bijîşkekî tirk ser kaxezeke mor kirî nivîsî bû, wekî Riza Uzvarîş pey 53 nexweşiyêra wefat kiriye. . . .Çi-b Riza hat?-ji hev pirsîn,- Bi wî mêrê sip-silamet. . . . Nexweşiyê mir, yan bi qeziyê Yanê kete tora nemerd?. . . "TU BI VAN ÇÎROKA EBÛRA XWE DIKÎ?" Sala berê xatiya bavê min- Kida îvo, ji gundê Pampa Kurda (naha Sîpan) hatibû mala me. Bavê min, Hecîyê Cindî, bona nivîsara zargotinê çîibîi gundên kurmanca.Du rojê dinê bavê min hat.Çawa hergav-bona hatina xatiya xwe zef şa bii, paşê balole kaxez danî ser textê xwe ii bi beşereke xweş, ji xwe pir razî, go: - Min xizneke çawa berev kiriye...Eva beyta, ku min bemivîsiye, filankesê gotiye, eva kilama - bêvankesê. . . Xatiya Kidê pirsî, go: -Tu navê wan meriya jî dikî deftera? Dê û bavê min u xatiya Kidê Go:- Erê welle, navê zarbêja miqîm dinivîsim! -De wekî usane,-xatiya Kidê bi şabîin got,- êvarê

ezê jî tera du-sê çîrokên biçîik bêjim, navê min jî, fireya seheta  
 xwe, têke deftera. Go:-Ser çeva, xatî can, tek tu bêje! Êvarê xatiya  
 Kidê çend hikyatên çîik gotin, îi Hecîyê Cindî ber nivîsî. Sibetirê kêfa  
 xatiya Kidê tunebîi, bêhewas, medekirî bîi. Ewê go:- îşev-mişev  
 xew nekete çevê min,- îi berxwe ketî, melîil zêde kir, - mala minê,  
 ax min qirikê... Hecî, lawo, tu hema bi van çîroka, qelîbotka ebûra  
 xwe dikî?. . . Hecîyê Cindî emirda kê mî dîkenya, lê vê carê bi dil têt  
 kenya, rabii xatiya xweye kinêze xîret paç kir îi go: - Xwedê min  
 bêy "çîrok îi qelîbotka" neke, xatî can. Ez wana zef hiz dikim,  
 naxwezim ewana bêne bîr kirinê, unda bin: ji xanimê mîna te hîvî  
 dikim-minra beyt, kilam, hikyat, qelîbotika bêjin, îi ez jî ber  
 binvîsim. Sal buhurîne... Belê, Hecîyê Cindî bi zargotinê (folklorê)  
 ne ku tenê ebîira xwe, lê usa jî ebiira gelê xwe dikir, ebiira ruh ii  
 rusqetê. 54 Hecîyê Cindî jiyana xwe pêşkêşî "milkê malê"-  
 berevkîi-in, lêkolîn ii weşandina zargotina gelê xweyî pir hizkirî kir.  
 Salêd şerê cîhanê yê yekemîn, hêna zulma Romê, rev îi bezê  
 Hecîyê Cindî ji êl ii êşîra xwe qetiya. . . , xunavê xwe: dê îi bav, xûşk  
 ii bira, kalik îi pîrikêd xwe unda kirin... êtînix.anada mezin bîi.  
 Hecîyê Cindîra tenê mabiin mtbê kunnanciyê, xîreta miletiyê û  
 sidqê qencyê. Gundên Ermenîstanêye kurmanca- Elegez,  
 Qundaxsaz (naha Riya teze), Pampa Kurda (naha Sîpan), Heko,  
 Tilik, Gelto îi yên din bona Hecîyê zarotiya Zargotin Cindî wî jêra bi  
 - bîi tomerî bîine gundê duda. wîye Emençayîra dengê dayika  
 hizkirî Zozana îvo. Zilamê yêr ii i"nisken, dê û bav undakirî  
 r«>CWs» bi hesta undakirinêye xedar texmîn kir, wekî durr û  
 cewahirê gel- beyt-serhatî, hikyat, kilara, meselok jî dikarin bêne  
 unda kirinê. Hecîyê Cindî nivîsiye: "Xizneke cimete dewi- û zemana  
 xwey kirî hema li ber çevê me dihelya, beteve dibii. . .Ewê

femdarîyê rihetî nedida min..." Û ewî ber zarê zarbêjan nivîsî..."Min çîqa zargotin dinvîsî,- Hecîyê Cindî danî bîra xwe,- ew aqas minra dibîi xîin îi goşt, ii min qîrar kir, wekî duiT ii cewahirê zargotina me berevkim, undabîinê arzîtiya wekî xilaz ew bin, ne lê ku usa jî tenê ji bibine gelek zanyariyê, arzîtiya silsileta. Zargotina me pir dewlemende, îlahî beyt-serhatiyêd wê kevirên qîmetlîne. .

." Hecîyê Cindî sala 1936-a, 28 saliya xweda berevoka "Folklor kurmanca" hazir kir îi da weşandinê. Amadakirina vê berevokê karekî pir giran bû, qewraandineke berbiçev nava dîroka çanda kurdada. Ji 660 rîipêlêd wê 584 rîipêl Hecîyê Cindî nivîsiye, lê tenê 76 riipêl -hogir îi pismamê wî, kurdzanê eyan Emînê Evdal nivîsiye. Putîika "Folklor kurmanca" sala 2008 li Stenbolê weşanxana Avêsta da bi tîpên latînî û li Erbîlê weşanxana Aras da bi tîpên erebî hatine weshandinê (bo 100 saliyaji dayîkbûna Hecîyê Cindî).

Zêndîtiya xweda Hecîyê Cindî 82 pirtîik dane weşandinê- yêd 55 zanyariyê, dersa, pêdagogiyê, zargotinê îi bedewnivîsai-ê.Ewî romana bihagiran "Hewarî" nivîsî, kîjan bi zimanê rûsî, emienkî, erebî hate wergerandinê û weşandinê. Heta 400 gotar, lêkolîn, pêşxeberên wî îi qinyatên mayîn rojname îi kovarên başqe-başqeda hatine çap kirinê.Bi veçêkirina Hecîyê Cindî bi deha çîrokên kurdî bi zimanê ennenkî ii riîsî di kitêb ii berevokên cudada ronkayî dîtine. Hecîyê Cindî sala 1985-a, pirtîikeke mezin, ya ji 880 rûpelî - berevoka "Meselok ii xeberokêd cimeta kurda" da weşanê.

"Nava vê berevokêda meselok, xeberok û fîrazêd gelê kurda hatine cî-war- kirinê, yên ku bi nêta dîrokzaniyê, terbetiyê, bedewsinetiyê pareke Ewana bona hîndariya zargotina kurdaye dewlemende zefe hêjane. zimên, bedewnivîsarê, dîrokê îi miletzaniyê çevkaniya ferzin",-em ser riipêla berevokêye pêşin

dixîinin. Akadêmîkê eraieniyayî eyan Aram Xanalanyan pêşxebera pirtîikêda nivîsiye: "Ev ênsîklopêdiya gelê kurdaye-ya emirê wê, aqilbendî û fikirdariya wêye bedewsinetiyêye. . ." Du salê din, 80 saliya xweda, H. Cindî du pirtîikên xwe jî dane weşanê. Yek ji wan berevoka "Hikyatêd cimeta kurda"-ye pêncê bû. Sala 1980-a bîi. Gurçîkê bavê min dêşyan. Çîibîi bal doxtir, gotibîin : "Kevir gurçîkên teda hene, gere opêrasî kin. Dilkê bavê min jî nesaxlem bû. . . Wan roja dayîka me xemgîn digot: - Hecî here gurçîka opêrasî bikin, dive dil teyax neke, axir, xwe xwe jî emirda mezine. . . Firîca me jî dudilî bii. . . Em jî hey dayîka xwera qayîl dibîin, hey Firîcêra. Dayîka min gilî fikir, digo: - Rokê ez hişyar bûm, min dî Hecî ber textê xwe rûniştî, nivîsara xwe dike. Kuta kir, go: "De ez hazirim, rabe, rabe em hevra herine nexweşxanê. Bira neferên mala min gunê rain nekine sitîiyê xwe, yek bêje: "Ê ne min got, wekî ne lazime", ya din bêje: "Ê ne min go"... Ezim cabdarê xwe... Biliv, min biryar daniye, kincê rain hazirke, em rê kevin. . . .Roja operasiyaye Herao îi Onîkê tîyên min jî ji Pampê hatibûn ber nexweşxana "Lêç komîsiyê" (ew nexweşxana gire-gira bîi û îisa jî ya doktor-profêso). Onîk ji beriyê xwe keweke sipî derxist, da destê Zoroyê min, go: 56 - Kurê min, me rêva girtiye, hanê lezekê bigire xwe ii berde. . . Zoro berda, kew firî çii ser zinarekê pêşberî nexweşxanê riinişt. . . Hemo go:- îşalla, her tişt wê pakbe, baş be. Usa jî bîi. Kevirêkî şimşat (raeriv tirê kevirê nava berêye) qasî fmdeqekê- ji gurçîkê bavê min derxistibîin. Pirtûkxanek Hecîyê Cindî Salên 90-î Salên 90-î bo malbata min saline ne baş biine. 1-ê gulana sala 1990-î bavê min çii ser dilovaniya xwe. 17-ê mijdarê sala 1993-a xîişka min Firîce wede zîitir xatirê xwe ji cîhana ronik xwest. 3-ê gulana sala 1997-a Fêrîkê Êsiv bêwext çii ax vl berê sar,

Pampêda hate defmkirinê. Hecîyê Cindî hatiye rewakirinê: Sala 1934-a bi Hurmetnama herêma Ermenîstana sovêtiyêva Sala 1946-a bi Mêdala "Bona xebata efat li şerê welatîyêyî mezin" va Sala 1951 -ê bi Mêdala "Ji bo karê efatîyê" va Sala 1955-a bona karê xweyî berbiçev di dereca kurdzaniyêda bi Ordêna "Nîşana hurmetê"-va Sala 1956 bi Mêdala "Ji bo serkevtina kar ûi xebatê" va Sala 1959 bi Hurmetnama wezareta Ermenîstanê ya ronkayê va Sala 1959 bi Hurmetnama Akadêmiya zanistiyê va 57 Sala 1960 bi Hurmetnema herêma Ermenîstana sovêtiyê va Sala 1960 bi mêdala Kongirêya rojhilatziyêye cîhaniyê va Sala 1965 bi Hurmetnama herêma Ermenîstana sovêtiyê va Sala 1968 bi Hurmetnama wezareta Ermenîstanê ya ronkayê va (bo 60 saliya bûyînê) Sala 1968 bi Hurmetnama Komîtê ya komsomola va Sala 1970 bi Mêdala "Bo xebata efat" girêdayî 100 saliya bûyîna Lênîn va Sala 1972 bi nîşana Bona destanînêd zaniyariyê va Sala 1974 bi Mêdala ser navê ronakbîrê Ermeniyî mezin X. Abovyan va Sala 1974 bi nîşana "Karkirê Ermenîstanêyî zanîstiyêyî emekdar" va Sala 1974 bi nîşana bo "40 saliya hemcivîna nivîskarên sovêtistanê" va Sala 1975 bi Mêdala "Bona 30 saliya serkeftina Şerê weteniyêyî mezin" va Sala 1975 bi Mêdala "Bona 30 saliyê altindariya Şerê weteniyêyî mezin" va Sala 1977 bi nîşana "Serkevtiya pêşvana sosîalîstiyê" va Sala 1978 bi Ordên "Dostiya gela" va (bo 70 saliya bûyînê) Sala 1978 bi Hurmetnema herêma Ermenîstana sovêtiyê va Sala 1982 bi Hurmetnama Komîtê ya karkirêd çandê va Sala 1985 bi Mêdala "Bona 40 saliya serkeftina Şerê weteniyêyî mezinda". Sala 1985 bi Mêdala "Vêtêrana (emekdarê) xebatê" va Sala 1986 bi xelata rojnama "Rya teze" yê mexsûs "Bona wergerandina edebiyeta ermeniya bi kurdî" va Sala

1988 bi Hurmetnama herêma Ermenîstana sovêtiyê va (bo 80 saliya bîiyînê). Medalek jî ya dayîka mine (bo mezinkirina penc zaroka) "Mêdala dayîkbiinê" sala 1946. 58 Sala 1998-a 21-ê nîsana sala 1998-a înstîtîta rojhilatzanîyê ya Akademiya komara Ermenîstanêye miletîyêye zanîyariyê bona 90-saliya bûyîna kurdzanê pirremek, doktorê fîlologîyê, profesor Hecîyê Cindî sêsiya zanîyariyê amade kir. Wê sêsiyayêda zanîyarêd kurd î ermenî, wekîlên teşkîletên efirandariyê, civakî, neferê mala Hecîyê Cindî hazir bîin. Sala 2008-a ya sala 100 saliya ji dayîkbûna Hecîyê Cindî. SÊSIYA ZANIYARIYÊ LI YÊRÊVANÊ BO 100 SALYA JI DAYÎKBÛNA HECÎYÊ CINDÎ Sedirtiya Akadêmiya komara Ermenîstanê ya zaniyariyê ya miletîyê ii Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê 20 meha hezîrana sala 2008-a, bi mûnesebeta 100 saliya ji dayîkbûna Karkirê Ermenîstanêyî zanîstiyêyî emekdar, Hecîyê Cindî di doktorê zanînên fîlolojiyê, ya gilovera profêsor, nivîskar sêsiya sera Akadêmiyayê mezinda, zanyariyê amade kiribîi. Hate kifşê, wekî Hecîyê Cindî wek zaniyar, nivîskar, folkilorzan, folkilorberevkerê mezin, ronakbîr, xudanê putîkên dera bona dibistana xudanê navekî pir bilind î mezin bîi ne tenê di nava kurdên welatê Sovêtiyê, lê usa jî di nava temaraya gelê Kurd î Kurdistanêda. Ewî emirê xwe bi helalî î bê hêwişandin pêşkêşî pêşdabirina kurdzaniyê î canda kurda kiribîi. Kurdzanîn merem û mexseda jîyana profesor Hecîyê Cindî bîi. 59 Hecîyê Cindî ne ku rîipelekî nû li nav zargotinzaniya kurdî da vekir, lê bi lêkolînên xwe vê beşa kurdzaniyê ra bingehêke zanyaryêye xurt danî. Hecîyê Cindî kedêke mezin xist nava xiznedefîna Folkilora Kurdî... Hecîyê Cindî bîr danîn li bi hêjatî dinirxandin wek kurdzanê xêrxwaz, mezin, wek kurdê welatparêz dilsoz, rem, maqîil î helal. .

. ...Hecîyê Cindî mîrateke zaniyariyê ya dewlemend dû xwe hiştiye ii ew mîrat wê weke rênîşandar xizmeta nifşên kurdzanan yên nûhatî bike. CIVINA ENSTITUYA KURDÎ YA PARÎSÊ 14-a meha kaniina sala 2008-a civîna Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, bi miinesebeta 100 saliya ji dayîkbîina Hecîyê Cindî hate amadekirinê. Piştî^ daklada çrofêsoor Joyce Hecîyê Blau ya ser jiyan, kar îî barê kurdî Cindî, pisporên lîteratîira wekî profesor Muhsîn Omar, Dr. Lûicîna Cafarova, Enstîtuya Dr. Kufdî Borîs ya James, serokê Parîsê Dr.Kendal Nezan behsa kar û rola Hecîyê Cindî ya mezin di warê Kurdzaniyê da kirin îî pirtîikên wî dane nasîn. EZ ÇUBUME KURDISTANE Bavê min digo: Kurdistanana azad wê hebe îî dema riya Kurdistanê vebe hîin min agahdar bikin: bivin çenge axa ser mezê min li ser axa Welêt bireşînin". . . Serokê Yekîtiya nivîskarên kurd - Duhok kek Hesên Silêvanî minra nivîsî, wekî 22 meha kaniina sala 2008-a wê Hecîyê Cindî konferansê li ser îî amadekin, 60 daxweza wan ewe, wekî ez jî herim Kurdistanê u li wê konfêransêda biaxivim. Min kire serê xwe, wekî ezê herim Kurdistanê (çîiyîna min ya cara yekemîn bû). Lê temiyê bavê min? Ezê wê zivistanê çawa biçîima gundê Pampa sar, li ku zivistana heta mêtirek, dive hê zêde berf rîidinî? Civîn havînê, yan sivta payîzê bûya - ezê biçîima, lê naka...na, çîiyîn nedibû. Û min xwe kerr kir. . . Min zanibî ruhê Hecîyê Cindî wê min bibaxşîne... Nivîskar îî torevanê bi kemal, bineliye Urmîyê (îran), dostê mala bavê min îî mala me Hesên Shojaî Fîlmeke biçîik derheqa Hecîyê Cindîda amade kiribîi ii gere wê civînêda bihata nîşandayînê. Kurê min nikarbîi minra bihata ii me biryar danî, wekî ezê bi riya Urmîyê herime Kurdistanê. . . 18-ê meha kanûnê Urmîyêda Hesên, kurê xwe Husêynva . nmj its-L m ' hatibîine pêşiya min Hesên- îî em



Lêîyla çîine mala îî wan. Bermaliya xweşik kinêz, keça wê Nazîla delal benda me bîin. Min wê malêda xwe wek mala zar îî neviyê xwe texmîn fikir, awqa baş, bi dil îî can, bi ^ ^g beşera xweş ez dipejirandim. DaykaminûHesenShojaî, 2006 20-ê mehê, berbangê me berê xwe da ber bi Kurdistana Başîir. Rêva, min helbesta Fêrîk kire bîra xwe: "Kurdim, kuyî Kurdistan, ax dîl û bindesta min..." Lê min şîina ya Fêrîk digot: "Kurdim, kuyî Kurdistan, azad îî serbesta min"... Ji sînore Kurdistana îranê derketin, visa min dadan îî em peya çîine ber bi sînore Kurdistana Beşîir... Sînorvanekî kurd minra bi zimanê min, zimanê kurdî go: -Vîsa te tune, ez nikarim te berdim. De, sînor ser çiyêye, bakî sar dihat. Min teglîfhama, ku kek Hesen Silêvanî minra şandibii, nîşanî wan da - dîsa nebii. . . Camêrekî, ku bi avtoyê {digotin erebe) hatibî pêşiya me, go: - Berdin, evana mêvanê mene! Gotin:-Na, yaji Ermenîstanê hatiye bê vîsaye, em bemadin... Ez jî zef bêsebir îî hêrs bûme... Hevala çend mirovara têlêfon vekirin . . . ii. . . ez îda ser axa Kurdistanê bîim, Kurdistana xwe! . . . Wexta em erebê siyar bîin, min hêrs îî serma bîr kirin, bi dilşa go: - Serokê me sînorên Kurdistana me baş dide parastinê! . . . Kurdistana azad... xewna Hecîyê Cindî, Fêrîkê Êsiv, xewna 61 min... Em ser çiyayên Kurdistanêra, wan çiyayên kurdaye bedewe kaw îî kubarra derbaz dibîin, li ku bo azadiya Kurdistanê wek ava cew îî çeman xîina lawên kurda rijiyabii. ...Kela dilê min rabûbî, ji berku bi salan ez hisret îî benda rojeke wabîim... Bajarê Soran da em çîine xarinxanê, ew cara pêşin bîi, ku min xarinxana kurdîda nan dixwer, piştira em çîine Binkeya Zarê kurmanc u li wê derê em rastî karkirên Binkeyê hatin.Me nasiya xwe da kak Ferhan Cewher, xudiyê dezgehê zarê kurmanc, radiyo, kovar ii rojnama zarê kurmanc yê li soran... kek Ferhan derheqa

karê xwe da ji mera axivî. . . îî bi avtoke din em verêyî Êrbîlê khin. Erbîlêda wê êvarê em bîin mêvanê hevalekî Hesên. Ew heval, xanima xweye xaşik îî beşerxweşva ber derê mala xwe çevnihêriya me bun. Piştî xêr hatinê, hevaskirinê em çîine oda wana. Ewana rîimeteke mezin mesref kirin. Pey texte zêdekirinêra ez bi têtêfonê maqul Bedîran Hebîbra axivîm, mm sedema hatina xwe Kurdistanê jêra got ii hîvî kir, wekî 30 pirtukên min "Hecîyê Cindî, jîyan îî kar", ku weşanxana xwe ya "Aras"-da (Erbîl) dabîi weşandinê minra bişîne, bona ku em xwera bivine konferansê. Camêrî soz da. Piştira malxwê malê go: -Metê, tu rîisî zanî? Min go: - Belê, zanim. Go:- Cînareke mala hevalê min heye, xwexwe rîise, ezê naka têtêfona wê pê bihesim, tu pêra rîisî xeberde, bira bîna wê derê. Heta ez difikirîm "Rûs" îî Kurdistan?. . . ewê têtêfon da min, go: - De xeberde! Min go: -Zdravstvîytê (bi msî min ew silav kir). Min dengêkî nazik bihîst: - Zdravstvîytê. Me nasya xwe da hev. Min go, wekî ez ji Ermenîstanême, hatime welatê xevraa bavê xwe, Kurdistanê, min go, wekî sivê emê herine Duhokê, kêderê bo 100 saliya ji dayikbuna bavê min Hecîyê Cindî Yekîtiya nivîskarên kurd-Duhok konferansê bi cî tîne. Ewê bîr anî, ku çawa sala 1947-a Barzaniyê Nemir bi çekdarên xwe va çemê Aras derbaz dibe, ku Sovyêt wana sitar îî bi cî bike. Lê piştî zemanekî yê mayîna li Azerbeycanê, wan sirgîn dîkin Asiya Navîn. 62 Hinek ji wana sovetistanêda dizewicin, zarok ji wanra divin. Hinek xwendina xwe berdewam dîkin, zanîngeh ii institîta da têne qebul kirinê. Paşê, bi cefa, Mistefe Barzanî xwe dide nasîn, giregirên dewleta sovetê rastî wî tên, soz didin alî barzaniya bikin, ku ew vegerin Kurdistanê xwe. Û piştî 1 1 sala, sala 1958-a ewana mal neferê xweva vedigerin welatê xwe. Ewê gilî kir, wekî ew ji navça Saratovêye,

go, wekî naka Rusyayêda merivê we nemane. Min jê pirsî:- Çend zarê tene? Go:- Du keçê minin,- go,- xwendîne, mezinin, raêr kirîne, welatên Ewropayêda dijîn, neviyê min ji ida, şikir, mezinin. Me xeverdida îi xilazbîina xeverdanê timebû... Ez pê hesyam, wekî malxwê wê eva çend sale çûye ser dilovaniya xwe, wekî mala wanda tim zii"nanê kiudî îi rûsî xeberdane, wekî keçên wê zimanê msî li kurdî baş zanin, pey mtrina malxwê wêra hevalê mêrê wê, der- cinar guhê wana ser wêne. Dawiyê ji min pirsî: -Tuyê kengê vejerî Rusyaye? Min go:- Eze 5-6 rojê din vejerim Eraienistanê. Go: -Min dixwest te silav îi rêzên min bigîhandana Rusiyayê. . . Min go:- Ser çeva, pismaraê me Rusiyayêda hene, eze yeqîn silavên te bigihînira cî. [Lê usa qewimî, wekî ezji Êrbîlê bi balefirê hatim Stanbulê, Ezji îstanbulê çûme Moskvayê, vegeryame Yêrêvanê. li wir rastî Zera qîza xwe hatim, piştira Li Moskvayê ez çawa ji balefirê peya bûn, min esmanê bajêr niherî, go: "Erd u erşê Rûsyayê, silav û rêzên Mariya nis, wekî naka Kurdistana azad da dijî, pêşkêşî we dikim "... Dilê min sêldn bû, ezpirr keficweş bûtn, weM sozê xwe anîsêrî...) Sibeturê, pey xwerina teştêra, Hesên çîi Kurdistan TV ser karê xwe îi nîvro, çawa ku hat, dîsa mera textê nan amade kirin, ii piştira^me destîira xwe ji wê mala pîrr mêvanliiz xwest îi em rê ketin. Erbîlêda, rêva, hevlekî Hesên- kek Kafî jî erba me siyar bû îi me berê xwe da Duhokê, h ku sivetirê konferansa nivîskarên Duhokê wê bi cî bihata. Berî êvarê era gihîştine bajarê Duhokê. Ber derê raala nivîskara era ber heykelên zimanzan Sadiq Behadîn îi dîrokzan îi helbestvan Enwer Mayî egle bîin, piştira tevî serokê Yekîtiya nivîskarên Duhokê- maqûl Hesên Silêvanî û çend nivîskarên din, ku li ber derî çevnihêriya me bûn, em çîine hundurê 63 avayî.Sera mezinda li ser dîwêr tevî siiretên

nivîskarên din min siiretê bavê xwe jî dît îî ez pin dileşq bîim...Em çîin odeke mezin,ku nivîskar îî rewşembîrê kurd berev biibûn Me silaveke şîrin da hevdu. Em ku riiniştin hêja xwera-xwera xêrhatin ji mera xwestin. Wê demê ez pîrr dileşq bîbîim,min xwe xwedame. bextewar didît, wekî ez nava gelê Min pirtîikên "Hecîyê Cindî, Jiyana u kar", ku me ji Êrbîlê anî bîin, dan kek Hesên Silêvanî, ewî belayî ser hazira kir. Hesên Silêvaniyê maqul sê pirtîikên Hecîyê Cindî " 19 Şaxên Rostemî Zalî nii", lê serokê weşanxana bajarê Duhokê ya "Spirêz" kek Mueyêd Teyîb pirtuka bavê min "Hikyatên geleri", cilda şeşa, ku min amade kiribûn îî wanara bi riya întêmêtê şandibii bona weşandinê, dane min. Ez pîrr kîfxweş bîim bo wan pirtîika, ji ber ku min ewana teze didîtin.Min sipasiya xwe wana go. . . Du roja ez hotêla "Bnrcîn" da dimam. Şebeqa radibûm, min bi kîfxweşî ji pencera Hotêlê soqaqên Duhokê dinhêrî. Lawikên ciwan soqaq paqij dikirin, yê din- bi desta rê ber avfiya "vedikirin" û bi desta avto lia vi alî, ha wî alî "verê dikirin". Min dikana pêşber nihêrî: vekirî bîi u mirov hey diketin, hey derdiketin ji wê dikana mezin. . . Roja duda me teştê hema \* Ş hotêlêda Silêvanî xwer em çîin îî tevî rastî kek serokê Dr. Hesên civata Fadil \.^,..~.,.î ., parêzgeha Dûhok maqul Omer harin. . . Piştira rastî serokê PDK li Duhok maqul kek Serbest Lezgîn hatin. Ewana derheqa Hecîyê Cindî da bihîstibiin û bi dilşa me nasiya xwe da hev. Ewana derheqa kurdên Ermenîstanê, rojnama îî radioya kurdî da dipirsîn. Ez wan rasthatinên hewaskar tucara bîr nakim. Diira Kek Hesên Silêvanî ereba xweva em nava bajêr gerandin, me cîkî weke buhuşt dît- gola Duhokê, çiyaye Spirêz.... Piştira em birine mala xwe, me nasiya xwe da xaniraa Hesên Silêvanî- Şermîna xweşik. Ez pîrr dilşa bîim, wexta pê hisyam, wekî Şermîna

delal dibistanêda mamosta matêmatîkayêye. Em çîine rêstoranê,  
piştî nanxwerinêra çîine konfêransê. . . 64 KONFERANS LI SER  
PROF HECIYE CINDI Duh 22/12/2008 dem jimêr 3 piştî nîviro  
Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Duhok îî bi amedebîina nivîskar û  
rewşenbîrên parêzgeha Duhokê îî mêvanên ku ji der ve hatibîn ""-  
saxkirina bîranîna sedsaliya nivîskarê kurd Hecîyê Cindî bi cî anî.  
•,\ ' ". f Ev bi bîranîn bi merema rêzlênanê bîi ji bo ked îî  
zehmetiya ku nivîskarê hêja Hecîyê Cindî di ber çand îî edebiyata  
kurdî de kişandiyê, her weha di warê wêjevanî îî folklorê kurdî de,  
îî berhevkirina foUdora kurdî îî parastina vê folklorê de, ku di  
encara de bîin pirtîik û berhemên hêja îî pêşkêşî pertîikxaneyê  
kurdî biine. Her tayê wesana Yekîtiya Nivîskarên xwe Kurd ji bo  
Duhok daxwaznameya vexwendina hejmarek ji kesên rewşenbîr ji  
herêma Kurdistan îî ji derve ve belav kirbîi, ew nivîskarên ku li ser  
jiyan îî berhemên Hecîyê Cindî peywendî darin ii gelek sazî û  
dezgehên ragihandinê jî di vê rojê de amede bîin. Bemama  
bîranîna 100 saliya Hecîyê Cindî bi vî rengî bû: Yekîtiya Nivîskarên  
Kurd li Duhokê, ev bîranîn li hola Yekîtiya Nivîskarên Kurd di  
demjimêr 03:00 yê êvarê dest pê kir. Demjimêr 03:00 paş nîvro -  
Gotina vekirinê ji aliyê serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê  
Duhokê birêz Hesên Silêvanî. - Gotinek ji aliyê Pîr Xidir ve, endamê  
Parlemana Kurdistanê. - Gotina Firîda Hecî - keça Hecîyê Cindî: wê  
li ser bîrhatin û jiyana bavê xwe axaftinekê bike. •i,^;^,  
Kurtefîlmeke dikomentî li ser " î?/ r^ îSic>s jiyana îî xebatên Hecîyê  
aliyê nivîskarê Kurd Cindî, ku ji yê Rojhilata '^"'^ "^^ Kurdistanê  
Hesên Shojaî ve hatibû amadekirin, hate nîşandan îî her wesna jî  
bi çend deqan li ser jiyana wî axifî. Simînarek ji aliyê Dr. Ismayîl ~""  
Hesaf ve li ser romana Hecîyê Cindî ^ 65 "Hewarî", ku ji aliyê wî

ve hatiye wergerandin ser erebî hate pêşkêş kirin Simînarek ji aliye nivîskar Ismayîl Badî ve li ser Heciyê Cindî û berhevkirina filklora Kurdî hate pêşkêş kirin. Wê konfêransê da amade biin Fadil Omer, Enwer Muliemed Tahir, Musedeq Tofi, îsmayîl Badî, dr. Ismayîl Hesaf, Muhemed Abdula, Salam Balayî, Xalid Husen, Beyar Bavî, Şewket Sindî, Şemal Akreyî, Şerif Amedî, Dr. Ebdulfetah Botanî îî yên mayîn. (Derheqa Peyva Yekîtiya nivîskerên Heciyê yekîtiya kurd-Duhok di saxkirina Cindî 1908 -2008, ku sedsaliya serokê nivîskarên kurd-Duhok Hesên Silêvanî axivî, binhêre pirtûka "Folklor Kurda", Yêrêvan, 2009, rûpêl 143). \*\*\* Pey Konfêransêra Kek Pîr Xidirê hêjara em çîne bingeha Laliş ya rewşenbîrî u civakî ya ezdiyan. Ew bi giranî mîûzêxaneyê, li kîderê hatine berevkirinê pirtiikên kurdî yê kevin îî nîi, kofî-kitanê jina, bêşmêrt ii kolozên mêra, sîtil û fereqên kevin, destar ii tiştên dinê. Li wir têne weşandinê kovara "Laliş" ii pirtiikên kurdî. . . Sibetirê me demaxatir ji maqîil Hesên Silêvanî xwest, ku hatibîi Hotêlê me verêke û du karkirên wîra bi ereba wî em ji Duhokê derketin ii me berê xwe da Barzanê, gundê Barzaniyê Nemir, wekî herine ser tirba Nemir, kurê Wî îdrîs. Kurapê nemir- maqul Bavmezinê kurda Mistefe Barzanî yê Nemir. . . Ebdule Barzanî hate pêşiya nie îî em çîin ber bi mezêl- em çûne ser mezêlê Min li wir helbesta Fêrîkê Êsiv "Mistefe Barzanîra" xwend. . . Paşê min deftera bona serlêdankiran da nivîsî, wekî saya Barzaniyê Nemir ser axa beşeke Herêmeke welatê me ya azad Kurdistanê çê bîiye, ku dişibe keça dewletekê Heciyê îî ez jî- îro Cindî, 66 hatime Kurdistana xwe. . . Piştira em teglîfî malê kirin, texte danîbîin, mesrefeke baş kirin. Derheqa Heciyê Cindîda bihîstibîin, wî kurapî, kivş bû zargotina kurdî, mesele û metelokên kurdî baş zanibîin. Em vegeryan Êrbîlê

Îi ez vê carê sê roja hotêla Becan palas da mam. Hotêl gelekî paqij  
 Îi qenc bîi. Sibetirê em çîine Wezaretê Rewşenbîrî, rasthatina me  
 tevî wezîr Felekedîn Kakeyî hebû. Min xwera pirtûkên Hecîyê Cindî  
 biribîin, min bi dilxweşî ew pêşkêşî maqûl F. Kakeyî kirin. Li wir  
 nasiya min dan reportyorekê (heyf, navê wê bîr kirye) Îi sivetire ez  
 mêvanê Nevroz TV bîim Îi wek sehetekê ewê hevpeyvîn minra  
 derbaz kir. Hukumekî pîrr mezin ser min hişt çîiyîna min tevî  
 maqûl Pîr Xidir Ziyareta me êzdiya -Lalişa Nîiranî. . . Û ew Ziyareta  
 me xiit Kurdistanê meye azad dane. . . Ez ji Êrbîlê bi balefirê çûme  
 Stanbulê. Balefirgeha Êrbîlê da keçên kurde xweşike, spêhî,  
 çeleng, bi wergirtina kaw pîrr kêfa min anîn, ez dilşa kirim . . . Wan  
 rojên, ku ez Kurdistanê xweye azad da bîim, hey dikime bîra xwe Îi  
 min tirê ew xewnên şîrin û zerrîn bîine... Îi ez wê çîiyîna xwe ya li  
 Kurdistanê, wan rojên xweye bextewar tucara bîr nakim... \*\*\* Bi  
 mûnesebeta 100 saliya Hecîyê Cindî ev pirtûk hatine weşandinê:  
 1. "Folkîlora kurmanca" (ya sala 1936-a), diyarî bo sedsaliya  
 Hecîyê Cindî, weşanxana Avêsta, Stanbul, s.2008 2. Hecîyê Cindî,  
 romana "Hewarî", diyariya ji bo 100 saliya jidayîkbîina Hecîyê  
 Cindî, weşanxana Lîs, Amed (Dîyarbekir), s. 2008. 3. "Folkîlora  
 kurmanca" (ya sala 1936-a), weşanxana Aras, Êrbîl, (bi tîpên  
 erebî), s.2008 4. F. H. Cewarî, " Hecîyê Cindî, jiyana Îi kar", Yêrêvan,  
 s. 2007 5. F.H. Cewarî, " Hecîyê Cindî, jiyana Îi kar", diyariya ji bo  
 100 saliya jidayîkbîina Hecîyê Cindî, weşanxana Lîs, Amed  
 (Dîyarbekir), s. 2008. 6. Kilamên cimeta kurda, (248rîipêl) Yêrêvan,  
 2008 67 7. F.H. Cewarî, " Hecîyê Cindî, jiyana Îi kar", diyariya ji bo  
 100 saliya jidayîkbîina Hecîyê Cindî, weşanxana Aras, Êrbîl (bi tîpên  
 erebî), s. 2008 8. Folkîlora kurda, Yêrêvan, s. 2009 Bi mûnesebeta  
 100 saliya Hecîyê Cindî di rojnama Îi kovarên Yêrêvanê gotar

hatine weşandinê. Wan gotara bi kurtebirî tînim navê: YEVGÊNIYA VASÎLYÊVA, doktora zanînên dîrokî JAKLÎN MÛSAËLYAN, berendama zanînên filolojî (Kurdzanên beşa S.Pêtêrbiirgê ya Înstîtîta Rojhilatnasîyê ya Akademiya Rûsiyayê ya zaniyarî) BONA BÎRANÎNA ZANIYARÊ KURD YÊ MEZIN HECÎYÊ CINDÎ ...Navên Kurdistanê yen mezin weke stêrkan dişuxulin î riya berbi diiyerojê ronî dîkin. Ji wana yek jî nave zanyarê kurd Hecîyê Cindîye, yê ku nava çend dehsalyan da serokê dibistana folkilorzaniya kurdî yê naskirî bil, zanê stranên kurdî yê êpîkî, qehremanî û lîrîkî bî, mamosta îî organîzatorê zanyariyê yê bi kemal bii. ...Xezna berhemên kurdî yê gelerî ya giranbiha hate berevkerinê ji yalê Hecîyê Cindî da, zanyariyê hate îî xebata zanyar weke efatî, Sala 1964-a bê qehremaniya têzê nîrxandinê. parastina (dîsêrtasiyayê) nave doktorê zanînên filolojî dan ser Hecîyê Cindî, lê sala 1966-a nave profêsoyîyê îî nave bi rîimet yê Karkirê zanyariyê yê emekdar(kedkar) li Ermenîstanê. Hemdeman karkirina Hecîyê Cindî bilind nîrxandin. Bi awakî gelekî xweş îî bi cî îî war dîtina xwe derheqa wî da dîhar kiriye akadêmîk B..M. Kêdrov, yê ku kifş kir, ku Hecîyê Cindî li Yekîtiya Sovêtiyê gelek waran da cîyê yekemîn distand nava kurdên welet da. Ew bii xwendkarê kurd yê yekemîn, berendamê zanyariyê yê yekemîn nava kurdan da, doktorê zanyariyê yê yekemîn, nivîskar, wergervan, edebyetzan îî folkilorzanê mezin - Lomonosovê gelê kurd yê eynî. Karkirina Hecîyê Cindî himberî ya Institutêke zanyariyê 68 ya tamam dîkin. ...Zanyar berbiçev xwepêşkêşkirina bê diket bi himberî întêlêjansî, karê kûltûra bilind û bi xwe - sînor temamyê jiyana berhemdariya kurdî ya gelerî. Bîr û ramanên wî yê bilind dîharbûna xwe dîtin nava romana "Hewarî" da (bi wergera ser zimanên rûsî, ermenkî,



erebî bi sernavê "Û bahar hat" hate weşandîne -.) ya ku mirovan metelmayî dike bi wê helaliyê û paqijayê bi kîjanê xudan ew nivîsandiyê. Em dengê nivîskar dibhên, yê ku di nava xwe da aqilbendiya hikyat û destanên kurdî civandine, yê ku bîr û bawer, raman îî xiyalên gelê xwe dîhar kirine. Ji Rojnema 'Golos Armemyî'(rojnemêya Dengê Armeniyayê, bi zimanê rûsî), 20.03.2008 Wergera ji riisî - WEZÎRÊ EŞO NÎKOLAY HOVANÎSYAN Akadêmîkê Akadêmiya komara Ermenîstanê ya zaniyariyê MEZINAYÊ KURDZANIYÊ ...Navê Hecîyê Cindî ra girêdaye pêşveçûna kurdzaniyê li Ermenîstanê wek şaxekî rojhilatziyê yê mûhîm înstîtûta Akadêmiya Ermenîstanê ya zaniyariyê Bi saya kar u bû navendeke barê, ku wî u hogirên wî yên eyînî warî da Beşa Kurdzamiyê ya kurdzaniyê ya naskirî. Nifşa rojhilatzanên ermenî ya yekemîn, ku bi deh salan li dû hev li teniştê Hecîyê Cindî kar kiriye, ewî bîr tîne û bi hêjatî dinirxîne ne ku bi tenê weke zanyarê pispore, lê usa jî weke mirovê dilsoz, xêrxwez ii helal, pesindarê dostiya ermeniya-kurda. ...Hecîyê Cindî bi pêwendiyên qewîn va girêdayî bû bi ronakbîr, bi nivîskar, bi dîrokzan îî karkirên ermenî yên civakî ra. ...Hecîyê Cindî mîrateke zaniyariyê ya dewlemend dû xwe hiştiye, şedefî û îzbata kîjanê bîblîograpîya xebatên wî yên zaniyariyê yên weşandî dide. fiRojnema "Azg".(Milet) 12.03.2008 Rojnema "Zagros", adar,2008 Wergera ji ermenkî - WEZÎRÊEŞO 69 SARGÎS HARÛTYÛNYAN Akadêmîkê Akadêmiya komara Ermenîstanê ya zaniyariyê EMEKDARÊ ZARGOTINA KURDAYÎ MEZIN Kar îî barê Hecîyê Cindî yên pirsale û qazanca wîye zaniyariyêye mezin, bi gişkî van çar pirsê va tînen tomakirin: 1. 2. 3. Berevkirin, sîstêmkirin îî weşandin heykelên nimîinên çanda kurdan ya zar. Bingehên (orgînalên) tîkstan yên heykelên

zarbêjiya kurda (janiren cuda) bi zanyarî tomarkirin, sazkin û lêkolînkirin. Nimîinên zargotina kurdaye bijare bi zimanê ermenî û rûsî wergerandin, veçêkirin îî weşandin. 4. Pêwendî îî hevgerêdanên navbera zargotina gelên kurd û ermenî da lêkolînkirin. ...Tomerkirin îî qimetkirina şuxulkariya Hecîyê Cindî ya nehêvşandiyê (bêwestane) 60 salî di warê zargotinzanyê da, bi heqî gerekê bê destnîşankirin, ku ji Hecyê Cindî dest pê dibe, danîna bmgêha berevkin, bi zanyarî sîstêmkirin, lêkolînkirin û weşandina zargotina kurdaye dewlemend. Şexsiyet û emekê wî yî gewre, jibo kurdzaniyê iro bûye destanîneke nû kilasîk nêt, û dest û bi mektebeke ra nivîşê zargotinzanyêye miletyêye kirye, şiveryê kîjanê zargotinzanên pirsgirêkên nû. kurd dimeşin li pey merem çareserkirina Ji Kovara "Patmabanasîrakan handês" ya Akadêmiya Ermenîstanêye zaniyariyê (kovara dîrok-fîloloji, hi zimanê ermenkî), hij. I, 2008 Wergera ji ermenkî - ESKERÊ BOYÏK WEZÎRÊ EŞO MEZINAYÊ XUDANÊ KEDA MEZIN . . .Zargotinberevki îî zargotinzan, zaneyê edebyeta nivîskî, pîrosayîs û şayîr, diramatîirg, rojnamevan, wergervan, pêdagoj (mamosta), bi ser da jî karkirê civakî. Awa navên wan warên kurdzaniyê, edebyeta kurdî ya bi zar û nivîskî û bi giştî- çanda kurdî yen ne tamam, ku em dikarin bi hêjatî 70 bidin ser xizmetkarekî çanda kurdî yê bi nav îî deng, yê mezin li Ermenîstanê îî Yekîtiya sovêtiyê ya berê Hecîyê Cindî. ...Hê di sala 1940- î da ewî bi têma "Beyt-serhatiya kurdî ya "Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî" têza xwe ya berendamtiya (kandîdatiya) zaniyariyê bi cî anî îî bû berendamê zanînen fîlolojiyê. Bi vê yekê Hecîyê Cindî bîi zaniyarê kurdî yekeraîn temamyê sovêtiyêda di ware kurdzaniyê da. Lê salal964 -a ji ber keda mezin di nava kurdzaniyê da bê parastina têzê bi awayê konkirêt, fermî (ew yek li

sovêtistanê degime çê dibîi) nave doktorê zanînên fîlolojiyê û pişt ra jî yê pirofêsoyîyê danîn ser wî. ...Û ji ber vê yekê bii, ku hê di despêka salên 30-î rojnema Rya teze da Hecîyê Cindî bi nav kirin wek mezmezke piştî canda kurdî. Eva jî şîina xwe da. Ya here belkêş ii miihîm ewe, ku vê nirxandinê hêz îî rastiya xwe pir salan pişt ra jî unda nekir, ronakbîrên kurd ya giran li Ermenîstanê hev girt, çê bîi. gava artêşeke wî da weke ...Bilî alîkarya di warê araadekirina kitêbên serrastkîra tîpan (korrêktor) ji bona çapxana, ku wî zemanê berê da karekî pir giran îî bi zehmet bîi, xem îî xerêqa qebîilkirin îî verêkirina wan hemû mêvanan jî bi giranî ser milê hogira wî ya jiyanê -kulfeta wî Zeyineva îvo bîi. Ewê salên 30-î di beşa kurdî ya radyoya Yervaneda sipîkêriyê kirye û piştî kutakirine Xwendinxana kurdi li wu- çawa mamosta kar kiriye, bi ser da jî pênc keç bi mêre xwe ra tevayî mezin kirin û dane ber xwendinê ji Rojnema "Grakan têt" (rojnemêya edehiyetê, bizimanê ermenkî) 21.03.2008 Derheqa Hecîyê Cindîda usa ji gotara berfireh ya nivîskarê ermenî Frûnzê Kîrakosyan "Ronakbîrê gelê kurd" di rojnaraa "Pakagîs" (Bende, bi zimanê emienkî) 18 îî 19 adarê, sala 2008 hate weşanê. \*\*\* Bavê me digo: - Em baylozê Kiu-distanêne nava xerîbada, gere navê Kurda bilind xweykin bi hînbîin îî karên xweye herrojî va. Her pênc dotên Hecîyê Cindî bîin pêşekzanên bi nav û deng. Me bi şîreta dê û bavê xwe navê gelê xweyî hizkirî nava hînbîin îî karên xweda, heval-hogkada, dercînarada hertim bilind xwey kirye. 71 Neferên mala havê min - rûniştîne: ji aliyê çepê Firîde, Hecîyê Cindî, Zeyneva îvo, Firîce. Sekinîne: Nazê, Zînê û Nûrê, sala 1981. DOTÊN HECÎYÊ CINDÎ DOKTOR FIRÎCA HECÎ CEWARÎ (1932 - 1993) Firîca Hecî 19 gotmeha sala 1932-a li Yêrêvanê hatibû dinê. Pey kutakirina

dibistana rûsîra, ew înstîtûta Yêrêvanêye doxtiriyêda (bijîşkyêda) tê qebiil kirinê. Sala 1956- a Firîce wê înstîtûtê bi serfinyazî xilaz dike îi dibe doxtira kurde pêşin. Dûra, Firîce çawa doxtira zara polîklînîkayêda derbazî ser kar dibe. Sala 1960-ê bona xebata berbiçav ew bi "Hurmetnema şêwra bajarê Yêrêvanê" tê rewakirinê. Piştra Firîce ordînatîirayêda tê qebûlkirine û pey kutakirinêra - ji sala 1963-a heta sala 1993-a Kafêdia pêdiyatiriyêda ya înstîtûta tamkirina zanebûnên doxtirayê dewletêda kar dike. Firîcê karekî giran bi cî danî: ders-fêrên xwe amade dikirin, gotarên zaniyariyê dinivîsîn, rojnama "Rya teze"-da gotarên wê derheqa nexweşiyên zarada dihatine weşanê, bi xwe di radîoya kurdîda qise-sohbet bi têraa doxtiriyê derbas dikirin, raala xweda mecal sazdkirin, wekî Şekroyê zeva dîsêrtasiya xweye kandîdatiyê, paşê ya doktoreyê amadeke,ewê sê kurê xwe mezin dikirin, pêra jî 72 întiyamên aspîrantiyê bi qîmetên bilindva didan îi dîsêrtasiya (têza) xwe dinivîsî. Jêra pir çetin bîi. Lê ewê çetina yî altkirin ii sala 1974-a dîsêrtasiya babeteke xwe bi têma dilikzaniyê (kardiyojijiyê) parast û bi serfirazî Şêwira endemên doxtirên zaniyar bi yekdengî navê ^ . MMV V ^m f n Wa doktora zanînên doxtiriyê danîn ser wê. Firîca Hecî (ortêda rûniştî), sala 1983-a nava xwendkar-kûrsantêd xweye doxtir Sala Dosentiyê 1980-ê Frîcê navê sitend. Rêfêrata da, kuji Rihyayê hatihwi. ^êda, ku rêktorata însfîtûtê hazir kiribîi, hatibii nivîsarê, wekî "Karê xweda ji sala 1966-a Frîca Cewarî xwe daye kivşê çawa pêşekzana bi dereca bilind, karkira helal. Ew ser dereca zanyarî-metodyêye wedê nihaye bilind doxtir- kiirsantara dursa dixiîne, sêmînar ii dersên piraktîk derbas dike... Ew komekdarîke qenckirin-şewirdariyêye mezin dide parêd komarêye saxlemîxweykirinê". 62 pirtiik ii

gotarên Fricê yê zanyariyê hene. Ji wan 25 gotar di salêd başqe-  
başqeda li Moskvayê çap bûne. Berhemên wê biinê qinyatên lazim  
ser textêd doxtirên zaraye kardîyolog îî ne tenê kardîyolog. . .  
{Fîrîcê bîblîografiya xebatên xwe minra nivusî bû, lê sed mixabin,  
naka di ne ber destê mine- F.H.). Lê ewê li Yêrêvanê û Moskvayê  
Konfêransêd doxtirên zarada çendik-çend daklad xwendine.  
Çendik çend cara dê îî bavê zarên nexweş derê raala wê xistine:  
"Doxtir, bibaxşîne, -gotine,- kerema xwe teseliya zarê bike".  
Çendik-çend cara, heta şevê jî, gazî nexweşxana kirine - bona  
komekê bîde nexweşê giran. Çendik çend cara doxtirê emienî bo  
xatirê nav îî hurmeta Fkîcê nexweşên kurd - zar bîiya, yan mezin -  
baştir nihêrîne, gîhdarya wane mexsîis ser wan nexweşa hebîiye. .  
. 1-ê gulana sala 1991-ê, era çîibiîne gundê Sîpanê, bo yeksaliya  
wefatbuna bavê xwe... Em çîine ser mezêlê bavê xwe îî hatin raala  
rae, ku 73 Fêrîk çêkirye. Oda me qilêrêda mabû. Min go: - Fîrîce,  
ezê naka gazî keçîka bikim, wê bêne alî me, van dera bidine hevdu,  
paqijkin. Fîrîcê go: -Na, gazî kesî neke, emê xwexwe her tiştî bikin.  
Paşê Fêrîk pencerê me vekirin, çîi av anî îî min îî Fh-îcêva camên  
pencera şîiştin, me mal temiz kir, ii textê nan 1i kursî lawik anîn,  
me textê xwe hazir kir, ii me gazî mirovên çend mala ktr. Hema wê  
rojê, Fîrîcê minra go: - Zanî, wexta min pencere dişîştin piştî min  
êşya, lê wexta min serata xwe guhast - êş derbaz bu, go, carekê jî  
mala meda usa qewimiye. Rokê ji got: -Fîride, wekî bavo sax bûya  
wê hergav minra bigota: "Here ser doxtir", paşê we têtê xista,  
bigota: "Te çawa kir? De soz bide bavê xwe, wekî tuyê sibê herî ser  
doxtir. . ." Lê naka. . . Ez berxwe ketim, xemgîn biim, min jêra go: -  
Naka ez tera dibêjim, egile neke, here ser doxtir, hiz diki ez jî tera  
bêm. Axir, tu xwexwe doxthî, gotî xwe binhêrî, te emii'ê xweda

awqas nexweş qenc kirine. . . te xêre, çira xwe nanhêrî, naçî bal doxtir? Go: -Dibeherimjî. Çîibii, qebîil dikir. dîagnoz Payîza rast sala danenîbun 1992-a u dermanê zêde Firêce nexweşxana Moskwayêda bîi. Min destûra xwe ji dibistanê xwest îî bi sê hevtiya çîime Moskovayê, ber xîşka xwe. Her sive ji mala hevala xwe Olyayê derdiketim, diçûme nexweşxanê, teriyêda vedigeryam. Firice beşerxweş dibii, xwe pak nîşan dida, ne dixwest ez bona wê xemgîn bim. Frîca Hecî bona nexweşa xwe nedihêvişand. Timê xwe nexweşara digîhand. Û hertim, hercar bi zanebînên xweye piir kûrva, bi merîfet, merivatiya xweye bilindva ewê pirsê çetin safî dikiin, alî nexweşa dtkir, ew qenc dikirin. . . Hezar mixabin, ewê tek-tenê alî xwe nekir... 17-ê raeha mijdarê sala 1993-a, zeman zîitir, 61 salîya xweda, ewê xatirê xwe ji vê cîhana ronik heta-hetayê xwest ii çîi ax û berê sar. . . Frîca xîşka meye rehmetî, xanim-xatîneke kurmanciyê bû bi îriidîsiya pirr mezinva. Ew aqil, merîfet, xîret, nazik, kinêzeke şewat, kevanîke erhede- xas xatîmeke gotma we bîi. 74 Û Fêrîkê Ûsiv nivîsî: FIRÎCÊRA Xas - xatîinê mînanî te- Rema Xwedêva perwede, Terbe-tore, temiz, delal, Maqîil, kinêz, heyf îî helal, Are-are têne dinya bed îî beter, Fêlîifmyaz... Vî teherî berî wede Guleke nûr şax vedide, Nermik, nazik disivsive, Şexte dide ser û dive. . . 18.11.1993 DERHEQA XWEDA Sala 1952-a min dibistana Yêrêvanê ya hejmara 5-a kuta kir. Dibistanêda du sala wek katibê Komsomola ya temamyâ dibistanê hatime hilbijartinê. Pey kutakirina dibistanê bi medala zêrva, min kîjan zaningehêda bixwesta dikaribû xwendina xwe bê întiyam berdewan kira. Diya min dixwest ez herim înstîtîita doxtiryê, hemîi lê mêla min ser Rîisyayê çend cî matematîkayê hebîi. Zemanê sovêtê Zanîngeh îî înstîtîtên didane komarên

sovetê, wekî cîwanên wan herine Rusyayê î li wir xwendina xwe berdewam bikin. Min jî dakîmanê xwe amade kirin û tevî bavê xwe em çîine wezaretê ronkayê. Sala 1952-a bî. Zanîngeha Moskwayê ser navê M. Lomonosov ji avayê kevin wê cîguhastî bîya avayê nî yê li Lînînskiyê gorî î armanca min ew bî, ez wê Zanîngehêda bixiim. Dakîmanê min hildan. Piştî mehekê mera gotin: - Hîin dikarin bilêta tirênê bikin. Ez tevî Hêra hevala xwe, ku Zanîngeha Lînîgradê da (naha S.Pêtêrbîrg) hatibû qebîl kirinê, em çîin me bilêtên xwe kirin, wekî roja şemiyê ji Yêrêvanê derên herine Moskwayê. Roja îniye bavê min 75 medekirî hat malê î mera got: -Ji wezaretê ronkayê minra gotin, wekî ew ciyê xwendinê, kîjan bona Firîdê dabîn, girtine dane kurê sereskereki, lê bona Firîdê gotin: "Ew dikare here înstîtiita (paşê bî Zanîngeh) Pedagogiyê da ya ser navê V. î. Lînî bixiine". Ez xemgîn bîbîim, hêrs ketibîim... Bavê min digo: - Dinya ya zorane, lawo, ber xwe nekeve, belkî ya xêr eve: tu qet tu ciya da jî naçî, tuyê Yêrêvanêda bixiinî. . . Ez hîvyê biim, wekî tiştê wê bê guhastinê. Le, na xêr, ciyê xwendina min dabîne xelqê. Eva emirê minda neheqiya yekemîn bû, ku hate serê min. ...Tirên wedê xweda leqiya î ez hevala xweva em rê kefin... Roja pêncê em ida Moskwayêda bîn.Hevala min ji min qetiya, çî bi tirênêke dinê here Lînîgiradê. Nansênê kurê apê Emîn hatibû pêşiya min.Ew jî hema wê salê înstîtiiteke dinê da hatibî qebîl kirinê. Em çîine înstîtiitê, kaxezên min hildan, gotin herine ciyê xwendikar têda dimînin. Me pirsî: -Kuye? Nêzîke? Jinekê hahanga ser kaxezekê adirês nivîsî î ew kaxez da me. Me kaxez xwend - ecêbeke giran. Razanxane ji Moskwayê dere -gundê Tarasovkayêdane, riya 2 sehet, du sehet nivane... (pêşiyê avtobîs, paşê metro, paşê êlektrîçke (trênê, ku

lez bi êlêktrîkê diçin), paşê 2-3 km erd jî nava mêşera gere herî bigihîjî ciyê mayîna bi tevayî. ...Ders destpê bîin. Seheta pênc il nîva, em, xwendikar radibîin, bi ava çemê Kilyazmayê serçevê xwe dişîştin, parî nan digirtin destê xwe û şiverêke teng ra me dida dîi hev, lezobezo diçîine ber bi stansiya tirênê... Pey darsa em diçîine xwerinxanê, me xwarina xwe dixwer, 2-3 seheta kitebxanêda ders hîn dibîin û dîsa lez diçun, wekî bigihîjine trêne... Bi gilîkî, minra pirr çetin bu.... Min rîsî jî xirab zanibîi, de dibistana ermenkî kuta kiribîi. \*\*\* 7-e meha mijdara sala 1952-a, roja 35 saliya Şorişa Oktobirê, em çîine dêmonstrasiyayê. Dêmonstasiya diçû ber bi meydana Sor. Ê min bi xwe Stalîn ser Movzolêya Lênîn dît. O, şabuneke çawa bîi...cejin bîi bona min... ewî destêkî xwe hevekî bilind kiribîi, dihejand îi bi wî 76 awayî em silav dikirin. Me dixwest xwe egile bikira, "Bavê" gel hema lezekî zêde bidîta, le eskerên dora me sekinî hey digotin: "Şîrê şag" (gavê xwe firekin, zû derbaz bin!) Gava em vegeryan malê, keçên oda me, yên ku Stalîn ne dîtibîin, xwezila xwe me danîn. . . \*\*\* Ez Moskvayêda carekê giran nexweş ketim, çend roja nediçîime înstîtûtê. Bavê min wan roja çûbû gundên nawça Aştarakê -bona nivîsara zargotinê. Roja şeşa ez çûme dersê, dêkanê (serokê) fakûltêta me gazî min kir, têlêgrama bavê min nîşanî min kir, go: -Bixîine îi lez bersîvê bide. Min xwend: "Rica dikim lez derheqa saxlemiya dota mm (nav u femila min) minra binvisin.Hecîyê Cindî (paşê adirêsa malê)".Bavê min perê bersîvê jî dabîi. . . Min dersê xwe nîvcîda hiştin û ez çûme postê, malêra têlêfon vekir. Dayîka min dengê min bihîst - pirr dilşa bû. Gilî kir, go: - Hecî gundê Kûrekendêda xewn ditibû, wekî "Firîde nexweşe". Berbangê xatirê xwe ji kesî nexwestibû û ji gund derketibû, çend avtobûs guhastibûn,



gihîştibû bajêr, çûbû postê û sê roj berê têtêgram şandibî û go, ev sê roje medekirî benda bersîva têtêgramê bû. . . Min go, wekî rastiye jî ez hevekî nesaxlem bîme, lê naka, şikir, pakim. Diya min bi girî, bi ricakirin go: ^ - Qîza min, xûşka min, qurbana tehim, xwe germ xweyke, miqati saxlemiya xwebe, tu dîrî meyî..., destê me nagihîje te, dinihêrî, çawa dilê bavê te va eyan bibû, wekî ne saxlemî, te gere bidîta çawa berxwe diket, bersîv hema rokê jî derengî keta, digo, ezê destîrê ji seroke înstîtûta xwe bixwezim î bi balefirê herime Moskveyê. . . Dê û bavê min berxwe diketin, wekî ciyê mayîna min ji Moskveyê dere. Bavê min hijmara telefona Çerkez B. bi têtêfonê got û ser da ani: - Ew dîvek alî te bike, ciyê mayîna te biguhêzin Moskveyê? Mm jî bi telefonê wîra xeber da, derheqa ciyê mayîna xweda û ricakirina bavê xwe da jêra got. Ewî go: . - Yeke, ez bêm xeberdim jî, wê alî te nekin. Ez berxwe kefi difikirîm: "Hema bigota, ezê bêm xeberdim, hîvî kim, çika çi dertê? Qe bavê minê bersîva usa bida xwandikarekî?.. Na, 77 tu cara!" Paşê heval î gundiye bavê min - apê Emîn hate Moskveyê. Minra pev ket, wekî hevra herin cem Rêktorê înstîtîtê. Em çîin. Rektor go, wekî piştî 2 sala, ji kûrsa 3-ada wê min biguhêzin razanxana Moskveyê, lê naka cî guhastin nabe. Apê Emînî borcnas minra go: - De hema iro bavê xwera têtêfonke, bêje, apê min hat, em çîin bal rêktor. . . Bîr nekî, hema îro, Hecî bêsebire. . . Meha bike. kanîinê bû, surr î serma bî. Rewşembîrekî dinê ji Yêrêvanê hatibî Moskveyê. Bavê min hîvî wî jî kiribî, ku alî min U ewî, qe nizanim çawa, nava çend deqada bi destê sêkrêtara prorêktor adirêsa mala wî dest anî, î em hevra berî êvarê çîine dikanê, ewî şereva here arzan kirî, botiliyê deh lîtirê tije kir î me berê xwe da mala mêrik. Min go: - Apo, ez nayem mala mêrik... (min şerm dikir). De dive

merik jî nemalbe... Go:-Birabe, neyê. Mêrik jî ne malbe hê baş, ezê bidime jina wî, bêjim: "Min şerev xîit bona mêrê wê ji Kavkazê aniye". Ez derva sekinim, tirs dilê minda, hela wê çawa be? 20-25 deqê dinê nasê bavê min, ji xwe razî, simêlê xwe ba dida, miqamek difîrand, hat gihîşte min, go: - Baş bû, mêrikî ne mal bii...,- go,- de tu sibê pey dera, dîsa bêyî ber oda prorêktor, ezê jî bêm, her tişt wê bê sêrî. . . Sivetirê ez çîim. Ewî, bê ku sirê bisekine, derê propêktor vekir, îi prorêktor bi eşq berbi me hat, em birin kabîna xwe û rokêda dokîimana cîguhastina mine wedeM hate çêkirinê, navda nivîsî bû: "Heta kutabîna sêsiya zivistanê {dêmek tenê mehekê, heta meha sibatê) ez dikarim bimînîm razanxana Moskvayêda li ser kuça Îsaçovayê. Piştî hevtêkê nasê bavê min gere vegerya Yêrêvanê. Ewî minra go: -Dive propêktor ji te pirske: "Apê te çîiye?", tu jêra bêje: -"Na, çîiye Lenîngiradê, konfêransê, piştira wê dîsa bê Moskvayê". Ez difikirîm, welle, evî rewşenbîrî çawa usa hêsa rîşet da îi naha jî texmîn dike, wekî mêrik dikare wê pirsê bide min? Paşê usa qewimî, wekî minra gotin, ku odeke wê razanxanê da ciyê mirovekî vala maye (keçeke çînî nexweş ketibî, vegerya bii malê). Ez tevî Nataşayê - keçeke şereza ji kursa me (xwexwe Moskvayê da duna îi zef heyra minda bîi) em çîine bal prorêktor. Nataşayê bi hêrs gotê, wekî filan odêda cî heye, çira Firîdê cî nakin? 78 (wedê mayîna min mabî 2-3 roj). Prorêktor ji min pirsî: -Apê te çîiye? Ez soromoro bîm, dilê rain kuta îi min... derew kir, go: "Na". Ewî go: - Sibê vê pirsêva ezê mijûl bim û go, wekî eger rastî wê odêda cî hebe, wê min wê odêda cîke. . . Î bellê. . .bi wî teherî saya wî rewşembîrî îi şereva here arzan, ku giva ji Kavkaze "xiit bona wî anîbîm" îi Nataşa hevala mine jîrek pirsê mayîna min wê razanxanêda hate

helkirinê. . . :Jc^:}; 5-e adara sala 1953-a me besa mirina Stalîn bihîst. Bi radîoyê gotin: "Stalîn miriye"...Mirov hemîşk digiryan, ber xwe diketin, tirs dilê îsanda hebii, digotin: "Dive şerr destpê be? Gelo bê Sitalin wê çawa be? Wê çi biqewdme?..." Roja duda, (yan sisya?) mera gotin: "Germ xwekin, emê sibê herin sera Mala yekîtiyê ya stiinxemilî, xatire xwe ji "Bavê gel" bixwezin". Û em çîin. Tu kes texmîn nedikir kî alî diçin. Mîna pêlên çêra ji kiiçekê bi hezara raeriv dihatin îi era tevî hev dibîin...Min îi Olya hevala min-em qewî ketibîin milê hev, wekî me ji hev neqetînin. . . Me texmin dikir bin lingê meda qelem, kitêb, berçevk, hebîin. . .Tu kes nikarbu kîiz be, lê binhêre. Çawa dibêjin - te derzî bavîta nediket erdê...Û dilkê çendik îi çend raeriva sist dibîi, ew diketine bin lingê xelqê îi wefat dibîin... Hema yek nivîskarê erraenî Komiinî usa wefat bîibii. . . Tenê sivetirê, bi halekî, em çûne hundurê wê serayê û me Stalîn dît. . . Piştira, ez 7-8 roja (îi ne tenê ez) nexweş raketibîim. ... Le paşê? Cinyazê Stalîn danîn Movzolêya Lenîn, rex Lênin. U meriv şevda diçiin, diketine sirê, wekî herin Movzolê, wî U rex Lênin bivînin. Rokê era jî çîin, suya me gihîşt em çîine hundurê Movzalê. Lênin lap çîik dihate xanê, le Stalîn ejdehek bû (raste, Stalîn bejnêda ne bilind bii, lê usa dihate xanê). ...Piştira Stalîn gunekar dikirin, "bavê gel" bûbû "dijminê gel". Xi-ûşçov daklada xweda da kivşê, wekî dema zor û zuhna Stalîn çendik û çend raîlîon merivê Sovêtistanê, yên. amûtam hatine gulle kirinê, kuştinê, sirgûn kirinê, wekî tira isanet tirs û xofeda dijît. . . Meytê Stalîn ji Mavzolê derxistin îi bin dîwarê Kirêmlêda defin kirin. . . 79 Sala min kivşê. çend 1954-a keçîkên name bîstsaliya kûrsa îi biiyîna dane yên me Min têlêgram pîrozkirinê ji dê û bavê xwe, xîşk ii hevalên xwe, ji Zeynev Mîrzoyêvnayê stendibii (ezê derheqa wê

xanira- xatîinêda li jêrê binvîsim). Salêd xwendina min bajarê Moskva yêda, bavê min du cara hate Moskva ye. Cara yekemîn, dema em çîine oda me, min go: -Bavo, çayê dixwezî? Go:- Erê, lawo, kesirîme, kerema xwe çakê bide min. Min lezand: totikê şîrin hebun, min danî ser textê xarinê, usa jî şekir u ez çîime peyî "çayê". Min çaydana mezinda ew "çay" anî, kire fîncana îi xwexwe jî runiştîm, ku çayê vexun. Bavê min ker îi lal dinherî, îi bi çawa min xwar. "çay" Lezekî Ez û bavê xwe, Moskva, s. 1954 sîrin kir şûnda go: totika -Firide, lawo, le ka rengê çayê? Ez kenyam, min go: - Ere welle, . . . em- xwendkarê vira royê du-sê cara dewsa çayê ava kelandî dikine fîncana, şîrin dikin ii veduxiin... {usa hîn bûbûn, naka difiikirim divekme timaya pera fikir, rengê çayê ne fikirî?). Sivetirê pey dersên minra ez bavê xwera çîime xwerinxanê. Ez divê dixwest bizanbûya, gelo xwerina me çawane? Ew xwerinxane hema avayê razanxana meda bîi. Bavê min serayêda ber text riinişt, rain xwerina sê cure hilda atî danî ser dext. Naha ez dixura, bavê min xwe egile dike, paşê kompot xwer îi minra go: -Seheta nivê pêncê, rêstoranêda wextê nanxarina meye, bibaxşîne, qîza min, wekî ez h vir kê dixiim. Min wê demê bawar kiribîi. Lê havînê, dema hatim Yêrêvanê, xuşkên min tirranê xwe min dikirin îi dikenyan: "Te çawa çaya bê 80 reng dabû ber bavo, te çawa avsîra netutişt xweribîi?"...Bavo jî beşerxweş rainra digot: - Firîde can, xîşkê tene, xweşiyê xwe te dikin, raeriv qet ji xîşkê dixeyide? ... Cara duyemîn bavê min tevî apê Emîn sala 1956-a hatibiine Moskva ye, wekî tevî Delirojiya edebiyet ii hunermendiya Ermenîstanê bibiina. Meha gulana sala 1956-a bû. Min intiyameke xwe zef baş dabîi, sê întiyam jî mabîin. Wan roja niviskarê rûsî eyan Aleksandir Fadêyêv xwexwe xwe

gulle kiribî. (Fadêyêv zefcara bi sûc dikirin, wekî nava romana xweye "Molodaya gvardiya "yê da (Givardiya ciwan) derheqa rola partiya Komûnîstiyêda kêr nivîsye.) Lê gel zef qedirê wî zanibî, zef jê hiz dikir. Meytê wî sera Mala yekîtiyêye stînxemlîda danîbiin î meriv mîna çemekî dikişyan ber bi wî avayî, wekî xatire xwe ji nivîskarê bi nav û deng bixwezin. Ez ji sive da çîbiim î paşî 4-5 seheta ancax ez ketime hundurê avayî, lezekê ber meytê wî sekinîm ii min kulîlkê sor danîn kêleka dikê...Ê ne bîra minda bî, wekî pey derketina ji hebisxanê Fadêyêv merivê pêşin bû, ku alî bavê min kir, kire ser karê wî. Min derheqa wefatbîna Fadêyêvda bavê xwe î apê Emînra gilî kir, go, wekî ez çûme, min xatirê xwe jê xwestiye. Bavê min çev bi hêsir go: -Te çi tiştê baş kirye, qîza min, tu çiyî te xatirê xwe jê xwestiye,... emirê te dirêj be... Fadêyêv... Fadêyêv bii, wekî pey berdana min ra alîkariya mezin da min û we. Bavê min wan roja li Moskvayê civînekêda helbesta xweye "Edilayî" bi ziraanê kurdî xwendibû û pir xwe razî mabû.

\*\*\* Moskvayêda rain nasya xwe da Zeyneva Mîrze Kêrîraovayê, bi rûsî min jêra digot -Zeynev Mîrzoyêvna. Ew jineke kurd bû, wekî salên dirêj li Kitêbxana (Bibhotêka) ser navê B.î. Lênîn dixebitî. Bavê min hejmara têtêfona wê mmra nivîsî bû. Ez bi telefonê pêra axivîm. Ew gelekî şa bû î em pev ketin sivetirê wê kitêbxanêda rastî hev bîn. Ez bêsebir hîvya wê rasthatinê bîim. ' 81 Pey dersara ez rast çûm kitêbxanê, bi têtêfona hundur têtê xist, ewê go: -Hema wê serayêda jî benda minbe, ezê naka peya bim. Serayêda meriv zef biin, lez-bez hildikişyan, peya dibiin î min carekêra texmîn kir, ku ew kulfeta qemere kawe kubar, nazike bejinbilind, ku ji pêpelînga peya dibe, Zeynev Mîrzoyêvnaye. Min wext unda nekir, nêzîkî wê bûm. Me silav da hev, ewê mîna

kinêzeke dilşewat, ez hemêz kirim, era çîine rîiyê hev. - Ez zef şame, wekî rastî keça Hecîyê Cindî hatim. Firide can, çawanî, de gilîke, . . . - î wê deqê min tirê ew nasa mine salane. . . Paşê em pev ketin, wekî ezê şemiya tê herime mala wan. IJ ez wextêda çûm. Ewana navend, sêntura bajarê Moskvayê diman, ser soqaqa Kîi-ov. Pirr baş ez qebûl kirim. Ez pê hisyam, wekî bavê Zeynevê-Mîrzo kurdê îranê bûye, sala 1909-a tevî birê xwe gihîştiye Moskvayê, hema nava şherda avayê sêqatê çêkirine. Qatê yekêda dikan bûne -li wir ewana hûr - mûrê, ku ji îranê danîn difrotin, qatê dudada pênc odê wana bûne, ya sisyarda - çar odê mezin. Pey Şorişa Oktobirê ya sala 1917-a, dewleta sovêtê wî mal îi milkî ji destê wan digre. Wanara tenê sê od - qatê yekêda dihêlin. Bavê wana pişfî pênc sala dimire. Zeynev Mîrzoeyvna sala 1908 -a ji dayîka xwe bûbî. Zeyneva Mîrze haj edebyeta kurdî hebû, digo, wekî zaniyarê kurd yên Yêrêvanê û Lênîngradê cama têne Kitêbxanê, matêryala, dakiimana ji wê dixwezî û ew bi hizkirin alî wana dike. Xîşkek Zeynevê hebî- Zehîre, du sala jê mezintir bû. Cemîlê kurê Zehîrê ne mal bû. Xanima Cemîl- Nîna rîis bû. Zehîrê gilî kir, wekî navê neviyê wê jî Cemîle, ew Zaningehêda beşa rojihilatzanîyêda dixîine. Dayîka wane dêmarî tatar bîi, xasiya Zehîrê, wekî li wir hazir bîi, yeke tirk bîi. Ez difikirîm: "Awqa millet malekêda îi usa bi aşîtî dijîn!" Dîwarê wanva xalîçê me kurdî darda kirîbîin, hîir-raîirê malê kevin biin, lê pirr rind xweykiri, dora katjimêra wan avzêkirî bîi... Karkira wane malêye keçeke ras texte hazir kh. Cîire-cîire xarin, salat danîn ser textê...Lê tu kes nêzîkî xwerinê nedibîi, Hey xeber didan, tiştê hewaskar dagirt. . . danîn bîra xwe... Paşê xanima raalê (dêraariya herdu xîşka), hate ber texte, ciyê xweda sekinî îi bi xwe gişkara xarin Û teze nanxarin

destpê bîi. Zeynev kêleka min rûniştibîi îî miqîm 82 dîna wê li min bîi, wekî ez bixum. Ewê ji min pirsî: -Avsîra kariya te qe xariye? Min go:- Welle, min ne xariye. Go:- Ew xarineke zef xweşe. Welle, her tişt xweş bîi... Piştira, foto nîşanî min kirin. Bavê Zeynevê yekî bilindî, bi simêl bii, bêşmêrt lê bîi, papax sêrî bîi. Zeynevê heyfa xwe danî, wekî kurdî nizane, tenê çend xeber zanibîin: "Ezîza min, qîza min..." Piştira em zef cara rastî hev hatin. Tevî Nivarda dota helbestvanê ermeniyayî mezin Hovh. Tumanyan, ku wê Biblîotêkayêda tevî Zeyneva Mîrze kar dikir, em çîine konserta artîstên ermeniya. Ewê tim namên çîik minra dişandin, di wan da ez agahdar dikirim: "Emê filan rojê herine opêraye; bona Têatira Mezin min du bilêt hildane", yan- "Rica dikim filan rojê bêyî mala me" u hwd. Rokê jî em çîine Sîrkê. Me nasiya xwe da artîsta sîrkêye Kurde nazik, xweşik Nazî Şîray. Ewê sîrkêda bi cilên jina kurde kaw, bi dêrê qeyîtankirî bi lênt û sîniyê gilovere reng-rengî dilîst, s; jongilor hersê çîine rêstoranê. . . bîi... Sibetirê em Havîna, wexta ez ji hêsabîinê vedigeryam zembîlek Moskvayê, tirî bona dayîka min Zeynev Hecîyê Cmdî û Nazî Şîray, 1954. Mîrzoeyvnayêra dişand. Pey kutakirina înstîtûtêra me fotoyê xwe hevra kişand. Ê dema me xatirê xwe ji hev xwest ewê melîl minra go: - Qîza min (bi kurdî), ezê zef bîra te bikim, min bîr nekî, dê îî bavê xwe, xîşkêd xwe silavke, . . . minra tim nama binvîse. . . Pistira ewê hersal bona sala teze, bona roja biiyîna hevalcêwiyê min dişandin...Min jî jêra pîirozname û peşkêş bi hizkirin, şêkirdarî dinvisî, zarokê min jêra dinvîsîn, ew weke pîrka xwe bi nav dikirin, ew jî kefxweş dibii. Cara dawiyê min Zeynev Mîarzoeyvna 83 zivistana sala 1990-î dît. Mala wana hilşandibiin, bona riya transportê firekin u ew herdu xûşkên pîr ji orta bajêr derxistibîin îî

perê bajêrda du odê biçîik dabiin wan -ser soqaqa Kaspiyskayê.  
Me hev dît, em pîrr kêfxweş bîin, ewê bi çevên tije hêsir, digot: -  
Bê kar minra dijware û pey jiyana orta bajêrda - vira jiyana merra  
pîrr çetine. Ewê miqatî li xuşka xwe dikir.... Hema wê salê jî, berî  
xîşka xwe, ew xas-xatiina kurde pîrr aqil îî pîrr kinêz îî helal ji  
cîhana ronik xatirê xwe xwest. Cara dawiyê min jê çend pirtîik û  
foto xwestin, ewê go: - Ezê tera bişînim. . . .- îda pêra negîhand. ...  
U ez hertim bi hurmet îî hizkirin Zeynev Mîrzoyêvna Kêrîmovayê  
tînim bîr îî jêra rema Xwedê dixwezim... ..Carekê ez pey hêsbîinê  
vedigeryame Moskvayê. Em ber tirênê sekinîbiin, çend deqê dinê,  
ewê rê keta. Dê îî bavê min, Firîce, du keçikê hevalê min hatibiin  
min verêkin. Me hew nihêrî Nûra xanim lezobezo tê ber bi vagona  
me. Hat îî namek îî tiir da hine fêkî da min, go: "Firîde can, nama  
min ii van fêkiya bivî bidî bîika min - jina birê min -Olga  
Sêmyonovnayê,. . . ezê jêra bi têtêfonê bêjim, eva jî adirêsa wê."  
Me xatirê xwe ji hev xwest îî tirêna Moskvayê rê ket... Roja  
gihîştîme Moskvayê, wê rojê ez ancax cî war bîim. Sibetirê ez çîim  
mala xanima şorişvanê Sîbîryayê yê pîrr eyan Fêrîk Polatbêkov  
(Fiyodor Lîtkîn). Min baqe kulîlk kirî, nama Nîira Polatovayê û fBkî  
hilda îî rê ketim. Meta Nûrê ciyê mala Lîtkîn bi hîr gilî minra nivîsî  
bîi îî min hêsa ew mal dît, min derê wan xist. Derî Olga  
Sêmyonovnayê bi xwe vekir. Ew mîna diya helal hate riyyê min, ez  
hemêz kirim, go: -Tu jî mîna Fêdkayê min esmerî, çevreş, porrê te  
reş. . . mui tirê xîşka wî biçîik hatiye mala min, - bona kulîlka zef şa  
bîi, go,- Firide, lê tu zanî Fiyodor kuda biçûya, gava dihata malê,  
ese kulîlk minra danîn....De keremke, de runî, de gilîke, 84  
/êrikfol^SkL). (1897-1918) Nyîira xîşka min gelo çawane?. . . Ezê  
nama wê paşê bixînim. . . Ewê lezekêda texte hazir kir, go: -



Duhva ez hîviya te bîime, niha jî pake, kes malda tune, kes me eciz nake, emê çayê vexun. îjar totik anin, go:- De, keremke. Paşê me çay vexar. . . Ewê derheqa diya Fêrîk da gilî kir, derheqa Anna Kartaşovayêda. Bavê Fêrîk - Egît axayê Emerîkê Polatbêkov rûniştevanê gundê Dîgorê bîi, li qeza Qersê, ser pirsê revandina jinê û mirina xîşka wê bi zemanekî dirêj sirgîinê Sîbîrê dikan. Li gundê Nîkolskê, ser qeza îrkûtskê, ew rasfî Anna Kartaşovayê (Lîtkîna) jinebî tê û dizewice. Havîna sala 1 897-a Fiyodor ji diya xwe dibe. Sala 1907-a bavê Fiyodor-Egîtê Emerîkê ji sirgîinê malêva vedigerê tê gundê xwe- Dîgorê. Egît axa Fêrîk îi Nyûrayê dibe dibistana rîisa li gundekî nêzîk, yê Dîgora ermeniya, li ku Fiyodor saya xwendina xweye pîr baş gelekî berbiçev dikeve. Anna Kartaşova her teherî dixweze mal neferê malbata mêrê xwera baş be, wana xweş bê, wan kara dike, çî ku bîikê dinê dikirin. Lê wextekê pê dihese, wekî dixwezin mêrê wê bizewicînîn, jineke kurd bînin ser wê weke hêwî. Dilê wê temiil nade, ew yek wê pîr dêşîne û xemgîn dike û gava ji mêrê xwe jî derheqa wê yekêda pê bihese, zarê xwe (herdu keçikê xwe, kurê xwe mezin Fiyodor) hildide dîsa bi zor û cefa vedigere yêra xwe- Sîbîrê... Lê Vasyayê biçûk (Baso) bal bavê dimîne. Zûtirekê Anna Kartaşova wefat dibe û Fiyodor herdîi xûşkê xweye biçûk Nîrê (Nyûrayê) û Marûsyayê ji gundê Tîilîinê dive Dîgorê, bal bavê xwe...10-15 roja Fiyodor gundê xwe hizkirî da dimîne û vedigere Sîbîrê, wekî Zaningehêda (ewî îda kolêc kuta kiribii) bê qebiil kirinê îi karê xweyî şorişvaniyêva mijîil be. . . Fêrîk Polatbêkov xwe tamamî pêşkêşî karê Partiya Koraiinîstiyê kiribû. Sala 191 8-a F. Polatbêkov kongira Sovêta ya dUda ya Sîbîrê da tê hilbijartinê weke cîgirê serokê Sîbîrê (Tsêntro- Sîbîrê), dibe Komîsarê geleriye...Ew

şorişvanê pîrr naskirî bîi Sîbîryayêda. . . Fêrîkê 21 salî bi destê dijaminên şorişê tê kuştinê. Hela Dîgorêda ewî helbest dinbîsîn. Pey zewacêra bo xatirê xanima xwe ewî pîrr helbest nivîsîne ... 85

Olga Sêmyonovnayê digo, her car wexta Fiyodor ciyada dişandin, ewî digot: -Olênka, ezê zîitirekê bêm... Û carekê jî nehat, ji gullê dijmina hatibîi kuştinê. Ewê çend helbestên pin- nazik yen Fêrîk Polatbekovê ciwan bona min xwendin, o, çî helbest bîin, çî kel nava wanda hebû....Awa sernavê wan: "Û ezê bijîm...", "Ez ku mirim", "Olgayêra", "Bager"... Ez ji mala Olga Sêmyonovnayê derketim, min xwe xwera digot: "Nava kurdada çî xweşmêr hebiine..." ... Carekê jî ez îi Olga Sêmyonovna îi îrîna keça Ferîk çîine mala Balêntîn Vladîmîrovîç Ryabîkov, Minra gotin, wekî Valêntîn Vladîmîrovîç nexweşe, nava cî nivînadane. Lê, bextra, ew îda ser piya bû û hatina mera pin- dilşa bû. Ewî go: "Silavên rain û xeberên min yên şêkirandinê Hecîyê Cindîra hene, ewî zef alî min kirye bona nivîsara pirtîika min ya derheqa Fêrîk Polatbekovda". Ryabîkov ew mirov bîi, kîjanî cara yekemîn derheqa Fêrîkda pirtîik sala da 1950-î bi semavê "Fiyodor Lîtkîn, Rolat-bek (Fêrîk, bavê min derheqa Fêrîk Fêdko)" nivîsî. weşandinê. Paşwextiyê Polatbekovda, pêşiyêd wî, jiyan îi karê wîda romana xwe "Hewarî" da \*\*\* Moskwayêda du malê pîrr xêrxaz jî hebûn: yek mala hevalê bavê minî êtîmxanê, fîzîkê pîrr eyan Xirîstofor Barsêgyan bîi, yek jî mala Sîisanayê bîi (xatiya wê û dê îi bavê min bajarê Erziniyêda nasya xwe dabîine hev, ii ewê adiresa xîşka xwe dabîi dayîka min). Mala Xirîstafor, min jêra digo dyadya (bi riisî:ap) Xaçîk, bi dil, eşq ez qebîil dikirim. Xanima wî Nastiya rîiseke kinêz bû. Digo: - Xaçîk îi Hecî êtîmxanêda wek birê helal bîine. . . Hema ez diçîime mala apê Xaçîk, xanima wîye dilovan, beşerxweş digo: - De zîi-zû mîlaya

(birêz) Firîda, destê xwe bişo û were oda xwerinxwerinê. Ha-hanga nan dadanî ber min îi digo: -Tu ji riya dur hatî, naka birçîyî. . . Eger ez ne birçî biima jî, ewê bi beşera xweş, bi zarê şîrin nan li min dida xwerinê. Digo; "Ezê te bidime mêr". Min ji digot: "Wekî 86 usane, ez îda nayême mala we". Zarê wana Lyova îi Lyîiba ji min çiihtir bun îi hatina rainra zef şa dibiin, min wanara, weke pêşkêş, hercar leyîstok dibirin. Lê mala Sûsanayê ez bi tegilîfkirina wana diçîim. Minra 2-3 meha carekê Sîisanayê têtêgram dişand: "Kerema xwe ledê, filan sehetê were mala me". Min miqîm zanibîi, wekî dayîka Sîisanayê Karîna xanimê, tolme bi belçikê tirya, yanê jî girar çê kirye... Min mala wanda xarinên mala rae bîr danîn, xarinên dayîka xwe. . . \*\*\* Pey xilazkirina înstîtîitêra ez vageryame Yêrêvanê îi min dixwest înstîtîita matêmatîkayê ya zaniyariyêda kar bikim. Lê lev nehat, min mêr kir îi min wek mamosta matêmatîkayê dibistana hejmara 34-ada (pênc sala), paşê zemanê dirêj ya hejmara 122-ada, lê dawiyê kolêceke Yêrêvanêda kar kir. Ez wek 50 sala mamosta bîime. Xwendkarên min pirr cara Olîmpiyada Firîda Hecî matêmatîkayêda {nava xwendkarada) ciyê bilind îi rîimet dightin çawa komara Ennenîstanêda, usa jî temamiya welatê Sovêtêda. Dibistanêda wek 30 dema ders dayîne sala ez seroka mamostayên beşa fîzîk-matêmatîkayê biime. Sala 1998-a bajarê Londonê da bi teglîfkirina Dr. Cewad Mella ez tevî karên "Kongrêa Nîştîmanî Km-distan ê 4 mîne" bîime. Firîda Hecî li Kongrêa Nîştîmanî Kurdi.itan êye 4 mînda diaxive. Ez sekinîme, ji rastê- ya pênc me. London, 10-11 oktobêr(cotmeh), 1998. 87 Meha sibata sala 1990-î wezaretê Ermenîstanêye ronkayê ez, çawa avtoreke (xudaneke) pirtîikên "Elîfba" îi kitêba "Zimanê kurdî" ya bona koma sisya, şandime

Moskvayê bona tevî semînarê bim. Min pirtîkên zimanê kurdî bona komên duda heta heyşta xwera biribûn Moskvayê. Wê demê temaşegeha pirtîkên dersa jî amade kiribîn. Pirtîkên me nava wekîlên koraarên sovêtiyê yên berêda heweskarîke mezin pêşda anîn. Du kulfet, ku karkirê wezaretê Qırqızstanêye ronkayê bîn, nezîkî min bûn, rica kirin, wekî ez nama wan bînim Yêrêvanê - bidime wezîrê ronkayê bona sitendin, yanê jî kirîna ji wan pirtîkên dersê zimanê kurdî. Li wê komarê dersdayîna zimanê kurdî hatibî amadekirinê. Wana digot: "Marza Oşêda kurd kompakt (ser hev) dimînin û dibistanada teze dersê zimanê kurdî derbas dibin, lê pirtîkên dersazefhindikin." Min xwestina wan bi cî anî, lê heyf, wanara pirtûk neşandin: wext hatibî guhastinê, sovêt hildiweşya. . Du meh derbaz bûn. Meha nîsanê ji wezaretê Ermenîstanêye ronkayê rainra têlê xistin, gotin, wekî mêtodîsta sereke ya wezaretê Qırqızstanêye ronkayê - Mavlyîza Abdîilkadîrovayê têlêgram şandiye, ez ii Fêrîkê Ûsiv teglif kirine bajarê Bîşkêkê. Min got, wekî em nikarin herin, ji ber ku bavê min bedhale. Sibetrê Mavlyûzayê xwexwe mala raera têlêfon kir, go: "Em piit rica ji we dikin, qe na sê- çar roja werin, dibistanên marza Xoşebilaxê bona rasthatina bi wera hazirya xwe dîtine". Min got: -Ezê sibê bersîva we bidim. Wê êvarê ez çûme mala bavê xwe. Firîca xîşk jî wirbû, ewê sivderêda minra got: -Kardîyograma dilê bavo ji ya berê xirabtire. Van roja dîsa raîkroînfarktê lê xistiye. . Lê dîsa naxweze bikeve nava cî- nivîna. Wê êvarê Hecîyê Cmdî ber textê nivîsarê rûniştî- pirtûkên xweye çapbûyî dihêrî, digirte xwe, vedikir, lê dihêrî, dîsa dadanî dewesê. Ketibî nava mitala, wan roja kême xeber dida. Min zanibî, wekî êdî çîyîna me nabe, lê heraa usa rain gotê: - Bavo, ji Qırqızstanê gazî min î Fêrîk dikin. Dixwezî

rasthatina me tevî mamosta îî xwendkarên kurd bi cî bînin...Qe nizamim, bona çîiyînê bersîva wan çî bidim? 88 - La-lawo, - diya min hêdî mim-a got. -Tu halê bavê xwe nabînî? Hûnê çawa wî halîda bihêlin, herin?. . . Hema wê demê bavê min serê xwe neîseyî bilind kir îî hêdî got: - Qirgizstan...herin, lawo, ese herin... Me demekê çevê hev nihêrî. . . Paşê Firîcê got: - Te ne bihîst- bavo çî got? Tenê wira egile nebin. îdî neçîiyîn nedibî. Mala meda me gotin, pêşniyarê bavê xwe ser çevê xwe qebîil dikir. Me lezand: kaxezê xwe hazir kirin, teherekî tîkêta (bilêta) balafirê dest xist, Mavlyîzayêra têlêgram şand: tên" îî sibetrê em rê ketin. . . .Em li bajarên Oşê ii Kok-Yangakê rastî xwendkar îî mamostên "Em kurd hatin. Ewana bi hewaskarî, balkêşî guh didane me.Era bûne mêvanê dibistana Kok-Yangakêye hejmara 4-a, dîrêktorê (serokê) kîjanê kurdekî ciwanî merîfet îsayê Mistefe Miisa bû.Li wir 328 xwendkarên kurd hîn dibîin. . . Piştî Oşê, Kok-Yangakê em çîine gundê Mîxaylovkê, h ku dibistana navîn hebî. Wê dibistanêda me bi hewaskarîke mezin dersê zimanê knrdî bihîstin -zaru "Elîfba" Hecîyê Cindî dixwendin (dersdar - maqul Nejmedînê Ahmed bii). Dawîyê me bi şabîin konsêrta koma xwendkarên wê dibistanê bihîst îî govend girt. . .Me xwera pii-tîikên kurdî biribîin, me ew bi hizkii-in pêşkêşî mamosta îî xwendkai-a kii-in. Paşê em birine çayxana bajarê Kok-Yangakê. Çayxane...odeke zef mezin bîi, ber dîwara îî ortêda textê dirêj danîbîin. Ser texta kulav û xalîçe raxistibûn, belgiyê mezin danîbîin. Mêrê mezin ser van texta çarmêrkî rîniştibiîn. Hineka belgî danîbûn berpala xwe, qelin dikşandin, qise dikirin. Hineka nerdî ii kişik dilîstin, ber gişka fîncanê çayêye fire danîbîin. . . Gava nasiya me dane wana, îî ew pê hesyan, wekî ez dota Hecîyê Cindîme, pêra-pêra pirsîn: "Gelo

dersdarê meyî ezîz heye?" Ewana sala 1937-a hatibûne sirgîinkirinê, hinek ji wan jî xwendkarên Xwendinxana Yêrevanêye kurdî bîn. Min got: - Zef nexweşe, bedhale. Emê nehatana, lê ewî, çawa ku pê hesiya, wekî era teglîfî Qirgîzstanê kirine, go- "Herin!". . . Min wanra got, wekî bavê min derheqa wanda mera gilî kiriye: bona sirgûnkirina êlê zef berxwe diket u bi dilekî keder digot: "Zuhn îî neheqiyên dinyayê ser gelê meyî zêrandî, bê dewlet barîne. . ." 89 - Belê, - yekî got, -halê cimeta me girane. Hilbet, wê mera jî derîkê vebe... Xûşkê, ji aliyê minda hevalê Hecî silavkin, bêjinê- Hemîd û hemîi xwendkarê te tera sehet-qewatê dixwazin. Gelekî xebirdan, dersdarê xweyî hizkirî bîr anîn. Paşê Fêrîk wanra çend helbestên xwe xwendin. Em ji çayxanê derketin. Çend lawik hatibûne pey me-me bibin raalê xwe. Yekî gelekî hîvî dikir, digot: "Kalikê min Ahmed şagirtê apê Hecî biîye, îro hûn mêvanê mene. . . Lê wedê me tunebîi, me razîbûna xwe da wan û rêketin, wekî lezekê zîi bighîjine Yêrevanê. \*\*\* 28-ê nîsanê, êvarê dereng em gihîştine Yêrevanê. Rojtha mayîn ez tenê çîime mala bavê xwe. Min derheqa bajarên Oşê, Kok- Yengakê, gundê Mîxaylovkê, çayxanêda gilî kir, min go: - Bavo, xwendkarên teye Xwendinxanêye wextekê tu silav dikirin, kêfê te dipirsîn. Bavo dibihîst, vedibeşirî. . , 30-ê nîsanê ez tevî Fêrîk çûne mala bavê xwe. - Apo - Fêrîk gotê, - xwendkarên teye Xwendinxana pêdagogiyê, ku salên 1937-1938-a hatibûne sirgîinkh-inê, bi hizkkineke pin- mezin, ' bi şêkirdarî tu bîr danîn. Tera sehet-qewet dixwestin. Apo, ewana têne bîra te? Bi dengê nizim, bi beşereke zef xweş got: "Erê. . ." Hema wê şeve, seheta duda diya min mera têlê xist, got: - Lez, nesekinin werin! Te digo, bavê min hîviya hatina me bîi, qey dixwest bizanbya xwendikarên wîye salên 30-i çawanin, wî bîr tînin? Hecîyê Cindî 1-

ê gulana sala 1990-î çii ser dilovaniya xwe. Me xwestina Hecîye Cindî qedand. Ew li Armênîayê gundê Pampa Kurda (niha Sîpan) teslîraî erdê kir. Ser mexber ev xetê Fêîlke Ûsiv hatine nivîsarê: Eglebe, pismam, ber vî raexberî: Vira defmiye maqîlê millet - Devweşê ulmê meyî ezberî, Serê pêsekin, pêşewitîyê merd. 90 Ez tevî dê û bavê xwe, s. 1985 Ez hatime rewakirinê: Sala 1981-ê bi Ordêna sovêtistanê ya bilindva, bi "Ordêna Ala Karkirinê ya Sor". Sala 1970 bi mêdala "Ji bo karê efatîyê"va, bo mîinesebeta 100 salya bûyîna V. Lênîn. Sala bîime. 1975-a hêjeyî nîşana "Serkevtiya pêşvana sosîalîstîyê" Salal962-a "Hûrmetnamêya wezaretê Ermenîstanê ya ronkayê" sitendîye. Sala 1979-a navê "Mamoste-mêtodîst" dane ser min. Sê cara (s.1971, 1982, 1984) wek endama şewira navçeya bajarê Yêrêvanê ya Şahîmyanê (salên sovêtîyêda) hatime hilbijartinê. Ji sala 1989-a pansiyona pêsonal (bi riimet) distînim. Ez ji sala 1957-a, tevî bavê xwe Hecîyê Cindî, tevî hazirkirina pirtîikên dersa yên "Elîfba" û "Zimanê kurdî"-bona dersxana sisya bîime. Min pey mirina bavê xwe Hecîyê Cindîra îî mabcwê xweyî rehmetî Fêrîkê Ûsivra ev pirtîik cara yekemîn amade kirin, komputorêda berev kirin îî dane weşandinê: Pirtûkên Hecîyê Cindî û yen derheqa wîda: 1. "Ûsiv îî Zelîxe", pêşgotin û nivîsamasî îî bemivîsara 10 şaxa (varyanta) yên Hecîyê Cindî, Yêrêvan, s. 2003. 91 2. "Hikyatêd cimeta kurda", kitêba 6-a (80 hikyat), Yêrêvan, s. 2005. Paşê- Duhok, weşanxana Spirêz, s. 2006. 3. "Dimdim", pêşgotin, nivîsamasî îî bernivîsara 15 varyanta yên Hecîyê Cindî, Yêrêvan, s. 2005, paşê - Êrbîl, weşanxana Aras, S.2006. 4. Şaxên destana "Rostemê zale" kurdî, cilda duda, pêşgotin, bemivîsara 19 varyantên nîi yên Hecîyê Cindî, Duhok, s.2006. 5. 6. Kilamên geleriye, Yêrêvan, sala 2008. Folkilora kurda,

Yêrêvan, sala 2009. 7. Firîda Hecî Cewarî -"Hecîyê Cindî, Jîyan u kar" çapkirina yekemîn, Yêrêvan, sala 2003-a. 8. Firîda Hecî Cewarî - "Hecîyê Cindî, Jîyan u kar" çapkirina duyemin, sala 2007, piştra Êrbîl sala 2008, piştra Dîyarbekir, weşanxana Lîs, sala 2008. 9. Firîda Hecî Cewarî -"Hecîyê Cindî, Jîyan u kar" bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, sala 2008. Pirtûkên Fêrîkê Ûsiv 10. "Hisref", Yêrêvan, 2004, piştra - Êrbîl 2004. 1 1 . "Gahavêj arvî apîn" (Ber ava gurr), berevoka helbesta bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 2004. 12. "Destan", Yêrêvan, 2005, piştra- Êrbîl 2006. 13. "Bera ber deriya", berevoka wergera, Yêrêvan, sala 2006. 14. "Kerdîga kilama", Yêrêvan, sala 2007. 15. "Berevoka berhema", cilda I-ê, Yêrêvan, sala 2008. 1 6. "Berevoka berhema", cida II-a, Yêrêvan, sala 2008. 17. "Berevoka berhema", cilda III-a, Yêrêvan, sala 2009. 1 8. "Pampa min", berheraên bona zarokan, Yêrêvan, sala 2009. Gotarên min: 1. Nema ji Moskvayê: Xwestma min hate sêrî, rojnama Rya teze, 12.10.1955. 2. Xwestina emir, Rya teze, 04.01.1958. 3. 92 Edilayî zarêd dinyayêra, Rya teze, 02.06.63 . 4. Matêmatîka mala Ûlyanovada, Rya teze, 08. 1 0. 1 969. 5. Fikir îî mitalêd dersdarê, Rya teze, 1 1 .09.1 971 . 6. 7. 8. Bona her şagirtekî zanebînên kîir, Rya teze, 02.09, 1 972. Matêmatîka mektebada, Rya teze, 22. 1 1 . 72. Qedirêdêibava, Ryateze, 02.,06.1973. 9. Qîmetkirina zanebînêd şagirtaye obyêktîv 0 1 .03 . 1 975. 10. Berbirîbîina dersdar ber bi şagirta prosêsa hînbînêda, Rya teze, 03.02,1979. 1 1 . Bona bextewariya meriva, Rya teze, 14.07.1979. 12. Terbetdariya zara mala Ûlyanovada, Rya teze, 14.05.1980. 13. Derheqa qîmetkirina nivîsarên xwendkara, Moskva, kovara "Matêraafîka v şkolê" (matematîka mektebêda),rûsî, # 5, 1980. 14. Borcê me, Rya teze,25, 07,1981.



15. Dersêd wekilandinê û mêtodêd tamkirina wan, Rya teze, 19.05, 82. 16. Pevgirêdanêd zanebînê îî xebatê, Rya teze, 1 8,01 , 1984. 17. Dersa edilayê, Rya teze, 01 .09.1984. 18. Valêntîna, kûrteçîrok, Ryateze, 20.07.1985. 19. Dersa teze mektebêd welêtda, Rya teze, 04.09.1985. 20. Hîmê şuxulvaniya me, Rya teze, 23.1 1 . 1 985. 21 . Anegorî xwestinêd îroyîn, Rya teze, 25.04,1 987. 22. Dokûmênteke berbiçev (nivîsara prof Xaçatiryan derheqa H.Cindîda, 1934). 02.03.1997. 23. Ji rûpêlêd rojêd giran (derheqa H.Cindîda (1937-1939), Rya teze, 04.05. 1991. 24. Firîca Hecî Cewarî (bo 60 saliya wê), Rya teze, 14.1 0.1992. 25. Bal Av. îsahakyan, Rya teze, 26.08. 1 992. 26. Dêlo # 7623 (Şuxul #7623), bûyareke dokûmêntal, "Golos kîirda aprel-may, 1993. i- j» 27. Dêlo # 7623 (Şuxul #7623), bûyareke dokûmêntal, "Golos kurda îyîin-îyûl, 1993. ^ ^^^^ ^.. 28. Ji emirê Hecîyê Cindî, Rya teze, 18,03.1994 - 03.08.1994 Oi hijmara 4 heta hij. 23: bîst hejmar 47. Dîktora (spîkêra) radîoya kurdî ya pêşm Zeyneva îvo, Rya teze, 12.02.1997^ 48 Bîranîn, bona roja bûyîna Fêrîkê Usiv, Rya teze, 29.10.1997. 49. Dêlo # 7623 (Şuxul #7623), bûyareke dokîimêntal, rojnama 93 "Golos Armêmî" (Dengê Ermenistanê, bi zimanê rîisî) 07.02.1998. 50. Gelo şiyêrê Fêrîk çawa biin? Ryateze, 18.02,1998. 51. Gelo ew sêr wê bêne şirovekirinê, (derheqa Fêrîkê Usivda), Rya teze, 29.04. 1998. 52. Tarêlîs 05.1998. (yek saliya mirina F. Usiv), rojnama "Hayastanî 15 Hanrapêtiityîin" (Komara Ermenistanê, bi zunanê ermenkî) 53. Celadê Bedirxan di emirê Hecîyê Cindîda, rojnama "Novî Kurdîstan", (Kurdistana nîi, bi zimanê riisî,)noyabr-dekabr, 1999. 54. Bîranîn (derheqa Fêrîkê Usivda), Rya teze, 04.. 1 1 . 2000. 55. Ji emirê Fêrîkê Usiv, Rya teze, noyabir,2001 . 56. Ji emirê Fêrîkê Usiv, Rya teze, dêkabr,

2001. 57. Ez meşa ciwanên kurd a ji bo perwerdeya zimanê dê silav dikim, Axîna welat, sibat, 2002

58. Wezîrê Nadîrî hat ditina Hecîyê Cindî, Ryateze, 03. 02.2003. 59. Serpêhatiyek tije zehmefî û pir ked (derheqa H. Cindîda), rojnama "Svobodni Kurdîstan"(Kurdistana azad), 1-31 oktyabr, s. 2004. 60. Serpêhatiyek tije zehmefî îî pir ked, rojnama "Svobodni Kurdîstan" 1 -30 noyabr, s. 2004. 61. Serpêhatiyek tije zehmefî û pir ked, rojnama "Svobodni Kurdîstan", 1-31 dekabir, s.2004. 62. Matematîkê dinêyan, profêsor Feyzoyê Egît, Rya teze, kaniina pêşin S.2006. 63. Derheqa dayîka xweda, Rya teze, sibat, 2007

Gotarên derheqa minda: 1. 2. Aracavomerî şarkîim (cêrga pêşvanada), ermenkî, kovara Sovetakan mankavarj (Mamosta yê sovêtiyê) # 10, 1968 Babayê Keleş - Dersdar, Rya teze, 19.08.1981

3. 4. Nivîsarên mêdalîsta yên baş, rojnama Sovêtakan Hayastan, (Ermenîstana Sovêtiyê), erraenkî, 27.06. 1976. Vstreçnaya svyaz, (riîsî), derheqa karen min wek parlamêntara Şêwira navça bajarê Yêrêvanê ya Şahîimyanê, rojnama Kommîinîst, bi riîsî, 20.06.81. 5. Mirazê Êzo Cafarov- Pirtûk derheqa kurdzanê mezinda, rojnama "Noviy vzglyad", hej.3-a, meha tebaxê ya sala 2003, bi zimanê rûsî, Tbîlîsî. 6. 94 Wezîrê Eşo -Firîda Hecî, Avesta, 2009

ZÎNA HECÎCEWARI Zînê pey kutakirina beşa kîmyayê ya Zanîngeha pedagogiyê - înstîtûta kîmyayêye organîk Sê ya zaniyariyêda kar dikir. gotarên wê yen zaniyariyê hatine çap kirinê. 12 meha tebaxa salal969-a ewê tevî çend hevala ji Moskvayê ŞEDETNAME AVTORIYÊ sitend, bona bi cîanîna fonnîleke nîi di Hecîyê Cindî levî dota xwe Zînê. dereca kîmyayêda. 4Vi. i:i\ . , (jHuTf, ^ri-i;!:. rr'Oii ::c-:<' Paşwextiyê, Zîna Hecî salên 1969-1999, wek kîmîk-înjînêra Sereke di zavoda Ênêrgonaladka da (Ênêrgosazkirin) karkirye.

Şedetnama avtoriyê ya Zîna Hecî 95 DOKTOR NURA HECI CEWARI  
Demên herdem berevkirina Cindî zargotina dikir: gelerî çawa fikrekî awazên Hecîyê mijîil sitrana binvise? Ewê fikirê, ku awazên gelerî weke tekstên sitrana qîmetlîne îi hewcê guhdai-yêne, gere bi nota bêne nivîsarê, xemgîn dikir. tabeti nedidan wî îi gelekî Û Nîira xûşk bû pispora sazbandiya kurdî. Li vir, Nûrê bi xwe, bi hîvîkirina min, derheqa xweda nivîsiye: Xwendin û kar 1948-56 Dîbistana navîn ya ser navê H. Hakobyane ermenîda ya bajarê Yêrêvanê xwendiyê, pêra jî dîbistana mûzîkê ya 7salyê kuta kiriye. 1956-1960 Kollêca ser navê R. Mêlîkyane miizîkayê da xwendiyê. 1960-1966 h Konsêrvatorya ser navê Komîtasda xwendiyê. 1967-1970 aspiranta înstîtîta Hunermendyê bîime ya Akadêmya Armênîayê Zaniyariyê. 1971 têzê xwe bi semavê "Hunera stranên kurdaye gelerî" înstîtîta Hunennendyê ya Akadêmya Amiênîayê ya Zanîaryêda xwey kiriye u derca Kandîdata (bi pivana nîijenîva Doktora) Hunermendyê stendiyê. 1965-1967 beşa Radîoya Yêrêvanê ya weşanên kurdîda weke berpirsyara para miizîkayê kar kiriye. 1966-1967 Dîbistana ser nave T. Çîixacyane mûzîkayê da çawa mamosta têorîa mûzîkê kar kiriyê. 1971-1993 înstîtîta Hunermendyê ya Akadêmya Zanîaryêda weke lêkolînêr îi ji sala 1977-a weke lêkolînêra sereke kar kiriye. 1900-1992 Zanîngeha ser navê D. Anhaxt da weke mamosta mîizîka kurdî kar kiriye. 1996-1998 Dîbistana Vîktorîayê ya zmananda /Australîa/ weke mamosta zmanê kurdî kar kiriye. 96 Endemetiya nava rêxistin-beşên çandî û karên cvakî - 1964-1970 rêdaksîona rojnema "Rya teze"-da bîime endem- karkera beşa "Jina". - 1976-1993 Armênîayê. bîime endema Yekîtiya kompozîtorên Sovêtyê îi ya - Weke 6 sala ji despêka sazbinê bîime endema înstîtîta Kurdî ya

Parîsê. - 1984-1991 bîime enderaa şewra Radîoya Yêrêvanê ya kurdî ya hunermendyê. - 1980-1981 ji bo 2 pîyêsên Têatra bajarê Tbilîsî ya kurdî ya E. Boyîk "Sinco keça xwe dide mêr" û T. Reşid "Xecê ii Sîabend" miizîka çê kiriye. - 1987-1990 bi hevkaî-ya T. Reşid bûme seroka koma xwendkarên kurdaye Stran û Reqasê ya Êtnografyê ya bi nave "Zozan" li rex însfîtîta Yêrêvanê ya Pêdagogiyê. Berhemên çapbûyî - Bîblîografîya Pirtûk, Lêkolînên zaniyaryê 1. "Kirdakan Jogovrdakan Ergarvêsti", (Hunera Stranên Kurdî yê Gelerî), weşana Akadêmiyîa ermenkî. Zaniyariyê, Yêrêvan, 1976, bi 2. "Stranêd Kurdaye Cimetê", Berevoka notenivîsar û têkstên kurdî tevî pêşgotin ii pênasînên zanîaryê bi ermenkî û riissî, weşana Akadêmiya Zaniyariyê, Yêrêvan 1983. Berevokên mxizîka gelerî 1. Kilamê Cimeta Kurdaye Govendê, weşana "Haypêthraf", Yêrêvan, 1960 (33 niraûnên sti'ana). 2. Klamê Cimeta Kurdaye Govendê, berga 2-a, "Haypêthraf", Yêrêvan, 1964 (56 nimîin). 3. Yekrê 1, Stokholm, 1981 (11 nimûn), Yekrê 2, Upsala, 1982 (9 niraîin), Yekrê,3 Vestêros, 1983 (6 nimîin), 3 berevokên stran îi 97 awazên gelerî bi hevkarîya Beşîr Botanî. 4. Stran îi Miqamên Cimeta Kurda, di Ahnanaxa "Bihara teze" da ya nivîskarên kurdên Ai-mênîayê, "Haypêthrat", Yêrêvan, 1983 (43 nimûn). 5. Mîizik, Dans îi Şerqîyên Kurdî, 2 berevokên stranên kurdî, hazirkiriîye M. Bayrak bi hevkarîya N.Cewarî û Z. Ozmanîan, weşana "Ozge", Anqere, 2002 (113 nimûn). 6. Ji bo çapê berevoka Awazên kurdên Armênîayê hazirkiriye. Gotarên zaniyariyê 1. "Komîtasî Yev Kirdakan Yêrajiştûtyûni", kurdî), kovara Fatmabanasîrakan (Komîtas îi raûzîka (Kovara Dîrok- Handês fîlolojyê) ya Akadêraiya Annênîayê ya Zanîaryê, Yêrêvan, 1965, hejmar 4, bi ermenkî. 2. "Krdakan Yerajştîityûni Hayastanûm",

(Mûzîka kurdî li Arraênîayê), kovara Sovêtakan Arvêst (Hunera Sovêtyê), Yêrêvan, 1970, hejmar 6, bi ermenkî. 3. "Kûrd Jogovirdî Erajştakan Kensaxi", (Deba gelê kurdaye mîizîkayê), herQvoka Stranî î Narodî Blijnêvo î Srednêvo Vostoka (Welat îî Gelên Rojhilata Nêzîk îî Navîn), ya 7-ada, înstîtûta Rojhilatzanyê ermenkî. ya Akadêmya Zaniyaryê, Yêrêvan, 1975, bi 4. "Narodnaya Mîizîka Kûrdov Armênîî v Svyazî so Srêdnêvêkovîm Monodîçêskîm Arraênîayê tevî îskîisstvom", hunermendya (Pêwendyên monodîke miizîka sedsalyên kurdên navîn), hexQvoksi Narodnaya Pêsnaya. Problêmî îzûçênîya, (Stranên gelerî. Problêmên 5. lêgerînê), ya înstîtûta Têatr, Mîizîka îî Sînêma, Lênîngrad, 1983, bi russî. "Napêvî Kûrdskoy Svadbî", (Awazên dewata kurda), li kavara Lirabêr ya Akadêmîa Zaniyaryê, Yêrêvan, 1985, hejraar 2, bi russî. 6. "Kîirdskaya Mîizîkálnaya Folkilorîstîka î Yevo Problêmî", (Folkilorîstîlca mîizîka kurdî û problêmên wê), berevoka Stranî î Narodî Blijnêvo î Srêdnêvo Vostoka, (Welat îî gelên Rojhilata Nêzîk îî Navîn) ya 13-da, înstîtûta Rojhilatzanyê ya Akadêraîa Zaniyarîê, Yêrêvan, 1985, bi russî. 7. "Krdakan Yêrajştîityûni Hay Mtavorakannêrî Gnahatmamb", (Miizîka kurdî bi nirxandina roşinbîrên ermenî), kovara Sovêtakan 98 Arvêst (Hunera Sovêtyê), Yêrêvan, 1987, hejmar 2, bi ermenkî. 8. "Kirdakan Jogovirdakan û Drans Parayîn Kêrtivaskî Yêrgêrî Rîtmakan Harabêrîityîinnêrî Masîn", (Derheqa Tarbêrakîimnêrî şaxên rîtmên stranên kurdî yên bi stîla Reqasê îî pêwendyên wan), kovara Lrabêr ya Akadêmîa Zaniyaryê, Yêrêvan, 1991, hejraar 3, bi erraenkî. 9. "Dengnivîsarên Sazbendya Kurdî", (li ser dengnivîsarên Kr. Kîişnaryove mêxanîkyê), kovara Nûdem, Stokholm, 1992, hejmar 3, bi kurdî. 10. 'Pirsên Dîrok û Têorîya Sazbendya Kurdî',

rojnama Hêvî, Istanbûl, hejmar 69, 70, 1998, bi kurdî. 1 1 .

"Pêwendyên Kurda îî Ermenya yên Mîizîkayê", Rêza gotaran, 1 - 5 kovara RojaNû, Stokholm, hejmar 98, 102, 104, 105-106, 107- 108, 1998 - 2000 îî 6-7 kovara Tîroj, Istanbîil, hejmar 8, 10, 2004, bi kurdî. 12. "Stranên Ezdîyên Ermenistanê yên Arxaîk îî Sedsalyên Navîn", kovara Tîrqj, îstanbûl, hejmar 11, 2004 û hejmar 12, 2005, bi kurdî. 13. "Derheqa Tîpologîa Serecemên Têkst îî Awazan îî Pêwendyên wan di Stranên Govendan de", kovara Tîroj, îstanbîil, hejmar 14, 2005, bi kurdî. 14. "Stranên Şêx îî Pîrên Ezdyên Armênîayê. Despêka Destanan îî Sh-anên Bajaryê li gel Êzdyan", kovara Dengê Ezdyan, Oldênbîirg, 29.06.2006, bi kurdi. 15. "Stranên Şêx û Pîrên Armênîayê", (bi zedekirinêva) di pirtuka Şêx Fexrê Adîan fîlosof û Xasê Ola Ezdîyatîye, berevoka gotarên Konferansa pêşkêşî şêx Fexrê Adîan, Oldênbîirg, 2009, bi kurdi. Têzên Gotarên Zanîaryê kû Konferansada hatine xandinê 1. "Mûzîka Kurdî û Problêmên Pêjdaçûinê", têzên Plênîima Yekîtiya Kompozîtorên Armênîayê, Yêrêvan, 1973, bi ermenkî 2. "Taybetyên Sfîlên Stranên Kurdî yên Geleryê", têzên Konfêransa 2-a ya înstîtûta Akadêmîa Armênîayê ya Hunermendyê (AAH) û Mûzêya 3. "Derheqa Çanda Janrên gelên Rojhilatê ya Sovêtyê li ser Çanda 3-a ya Armênîayê, Yêrêvan, 1976, bi ermenkî, riissî Stranên Strofik", têzên Konfêransa înstîtûta A AH, Yêrêvan, 1 977, bi emienkî, rûssî 4. "Stranên Kurdî yên Şaya", têzên Konferansa 4-a ya Insfîtûta 99 AAH, Yêrêvan, 1 979, bi ermenkî, rîissî 5. "Formûlên Rîtmên Stranên Kurdîye Govendê", têzên Konferansa 5-a ya înstîtîita AAH, Yêrêvan, 1982, ermenkî, riissî 6. "Pêwendyên Ermenya îî Kurdaye mîizîkayê', têzên Plênîima Yekîtiya Kompozîtorên Armênîayê li ser pirsên dîrok îî têoriya mîizîka

Monodîk, Yêrêvan, 1984, bi zmanê mssî 7. "Fikrandina Arxaîk di Stranên Kurdaye Gelerîda", têtên Konferansa Şêwra Çanda Cihanê ya Akadêmya Yakîtiya Sovêtyê ya Zaniyatyê, Yekîtya Kompozîtorên Arraênîayê îî înstîtiita AAH li ser problêmên genesis îî teybetyên formên kevnar yên çanda mîizîkayê, Dilican, Armênîa, 1986, bi riissî 8. "Himberîhevkirina Şaxên Strana "Ay berde", têtên civîna Zanîryê ya înstîtiita Akadêmîa Armênîayêye Etnografyê li ser Ekspêdîsîên folklorî îî êtnografîyên salên 1984-85, Yêrêvan, 1987, bi ermenkî 9. "Derheqa rîissî Striiktûra Têkstên Stranên Kurdîye Strofîk", têtên Konferansa 6-a ya înstîtiita AAH, Yêrêvan, 1987, bi ermenkî, 10. "Pirsên Lêkolînên Tîpologîa Mîizîka Gelerî li ser Dereca Niijen", têtên Plênîma Yekîtya Kompozîtorên Armênîayê li mûzîka Gelerî, Yêrêvan 1987, bi ermenkî, rîissî Notenivîsarên Stranan Rojneme, Kovar û Pirtûkên Folklorîda ser pirsên 1. 2. Di çend hejmarên rojnema Rya Teze-da, Yêrêvan, 1964 - 79. Hemî hejmarên kovara Mîizîk ii Huner-da, berpirsyar B. Botanî, Swêd, 1981 -85. 3. Kovara "Hunemema"-da, berpirsyar B.Botanî, Swêd, 1997. 4. Berevoka Folkilora Mara, Çend Nimîney-da hazirkirîye Malmisanîj, weşana Jîna Nîi, Stokholm1991 . 5. Pênasîna berevoka H. Cindîye Usiv îî Zelîxe-da, amade kiriye Frîda Cewarî, Yêrêvan, 2003 Gotarên Rojnemevanyê (Bijare) 1. "Cîizêppê Vêrdî: ji bo 145salya bîîna wî", rojnema Rya Teze, Yêrêvan,9.10. 1958 2. "Dostê Cimaeta Kurdaye mezin: ji bo 95salya bîîna Komîtas", rojnema Rya Teze, 18. 10. 1964 100 3. "Bolşoy Drûg Kurds koy Mûzîkî", (Dostê mûzîka kurdaye mezin) ji bo 100 salya bûîna Komîtas, rojnema Kommûnîst, 25.10.1969, bi riissî 4. "Ji Dîroka Dengnivîsarên Sazbendya Ciraaeta Kurda", Rya Teze, 15.11.1969. 5 "Klamêd Cimaeta Kurdaye Sovêtyê", Rya Teze, 15.1.1970 6.

"Kompozîtorê Xudanê Merîfeta Zor" ji bo 70 salya bûîna Aram Xaçatiryan', Rya Teze, 9.6.1973 7 8. " Uliradar Derheqa Mîizîka Kurdîda", Rya Teze ', 1 4.6.1973 " Derheqa Çend Pirsên Sazbendya Cimaeta Kurdada", Rya Teze, 15.11.1976 . 9. "Pey Rêça Dur-Cewahirê Cimaetyê", (li ser êkspêdîsya h gunden navça Telînê), Rya Teze, -i.n.^ ^ll. 10. "Kilamêd Cimaetêye Dewatê", Rya Teze, 9.12.1978 11 "Kilamêd Kurdaye Cimaetyê bona Zara", Rya Teze, 4.1 1 ,1979 Tbîlîsîyê), Rya Teze, 20.9.1980 12. "Bona Berevkirina Nimûnêd Teze", (li ser êkspêdîsîa bajarê 13. "Hayrênî Yergêr" (Stranên Welatyê), (li ser pirtûka A. Pahlêvanyane folklorî), rojnema Yêrekoyan Yêrêvan, 1.11.1980, biermenkî\_ . -.- c ^ ^- 14. "Dengbêjê Beyt-Serhatya", (li ser hunemiendya stranbej fçgite TQc\r), Rya Teze, 1.2.1981 , ^ ,. 15. "Rojêd Efrandinên Kurdaye Cimaetyê", (li ser Festîvala Kurda li bajarê Tibîlîsîyê), Rya Teze, 28.3.1 981 16. "Bengîyê Pêşeka xwe", (li ser hunermendya artist Ezîzê Bişar), Rya Teze, 22.S.\9S\ 17. "Folklor û Deba Moksê", (li ser pirtûka H.A.Orbelî, Rya Teze, 3.07.1982. 18. "Poêziya Kurdaye debê", (li ser pirtûka M. Rûdênko), Rya Teze, 5.01.1983. ^ ^ 19. "îskûstva îraqêye Wedê Niha", (li ser pirtûka A. Bogdanov), Rya Teze, 5.10.1983. 20. "Artîstê Merîfef", (li ser hunermendya artîst Hesene QuU), Rya Teze, 2.06.1984. ^ 21 "Kînematomografya Welatêd Asîa û Afrîkayê yen Ser Rya Pêşdaçûînê", (li ser pirtûka R. Sobolêv û O.Tênêşvîlî), Rya Teze, 11.6.1986. 101 22. "Nimîinên Teze Hatine Nivîsarê", (li ser êkspêdîsîa Qazaxistanê), Rya Teze, 10.12.1986. 23. "Sazbendya Gundê Qeşqebilaxê", (li ser êkspêdîsîa Qazaxistanê), Rya Teze, A.?,.\9%. 24. "Dengbêjê Cimaetê", (li ser hunermendya Mehmed Şêxo), Rya Teze, 29.4.1989. 25. "Xêrxazê Cimaeta me" (ber bi Teze, \5.\.\9%9. 120 salya bûîna Komîtas),



Rya 26. "Sazbendya Kurdên Zaza", Rya Teze, 9.0 1 . 1 99 1 . 27. "Xweyfî li Hebîina Meye Kûltîira Ruhanyê Bikin", RyaTeze, 16.01.1991. 28. Berevoka Folkilora Sazbendyê - "Govend", (li ser pirtîika Ferhad), Rya Teze, 12.08.1992. 29. "Stranên Destana "Dim-Dimê": ji arşîva prof H.Cindî', kovara riroj, 2009, hejmar 40,îstanbûl. 30. "Pirtûkên dersên stranê ji bo zarokên kurd", ji arşîva prof H. Cindî, kovara Tîroj, 2010, hejmar 41, îstanbûil. Gele gotar bi Radio ya Yêrêvanê bi zmanê Kurdî hatine belavkirinê. Gele gotar cvînanda îî sêmînarên zaniyariyêda li bajarên cuda- cuda - li Yêrêvanê, Tibîlîsîyê, Moskvayê, Mêlbîirnê, Sîdnêyê bi kurdî, ermenkî, mssi hatine xandinê. Berevkirina nimûnên miizîka gelerî dema Êkspêdîsiya 1. 2. 3. Navça Aparatê /niha Aragas/, Armênîa, 1 969, 1 1 0 nimîin. Navça Hoktêmbêtyanê, Armênîa, 1 972, 40 nimîin. Navça Telînê, Armênîa, 1974, 60 nimîin. 4. 5. 6. Instîtîita Hunermendyêda, Armênîa, 1975, 33 nimûn. Navça Telînê, Armênîa, 1977, 80 nimûn. Navça Telinê, Armênîa, 1 978, 45 nimîin. 7. 8. Navça Êçmîadzînê, Armênîa, 1 979, 3 0 nimîin. Bajarê Tibîlîsîyê, Gurcistan, 1 980, 50 nimîim. 9. Navça Êçmîadzînê, Armênîa, 1 980, 40 nimîin. 10. Navça Abovyanê, Armênîa, 1986, 82 nimîin. 1 1 . Bajarê Tbîlîsîyê, Gurcistan îî gundên Qazaxistanê, 1986, 300 nimûn. 12. Neavça Aragasê, Armênîa, 1987, 85 nimûn. 13. Navça Telînê, Armênîa, 1 989, 30 nimîin. 102 ^'^/,:^^: 'jrl-i..VX:' Mw: Nûra Hecî Cewaiî ji dengbêja stranên gelerî ser qeytanê tomar dike. Nura Cewarî Nîsan2010 NAZA HECI CEWARI Nazê xîişka meye ya biçûke, hizkirya gişkane. Ew yeke xeraxur, kinez, heyf, aqil îî xîrete. Demê ew şagirta sinifên 9-11 bii dibistana 122- ada raamosta wê ya matêmatîkayê ez bîim. Nazê ji matêmatîkayê dida. qewat bîi, zîi bersîva pirsên çetin Pey

kutakirina dibistanê ra, ewê beşa Kîbêmêtîkayê ya Zanîngeha Yêrêvanêda xwend îî bi serfmyazî kuta kh. Piştira, wek maraosta matêraatîkayê dibistanên Yêrêvanêda kar kir. Sala 1993-a raalêva koç kirm bajarê Biryanskê (Rîisya), li ku Nazê Zanîngeha Biryanskêda bîi dersbêja matêmatîkayê. 103 Ez tevî dayîka xwe Zeyneva Ivo, s. 2006 Derheqa zevên Hecîyê Cindîda vê gotara jêrinda hatiye nivîsarê: ESKERÊ BOYÎK PÎREKA HECYÊ CINDÎ: ZEYNEVA ÎVO ÇÛ SER DILOVANYA XWE 26 ê sibatê, sala 2007-a, 93 salyê da, li bajarê Yêrêvanê, pîreka zanyarê mezin Hecîyê Cindî: Zeyneva îvo çîi ser dilovanya xwe. Dayka Zeynev, ew pîreka piremek rêke diîr û dirêj derbaz bîiye. . . .Sala 1931-ê ew ii Hecyê Cindî dizewicin. Zeyneva Ivo h ber textê Hecîyê Cindîyî xebatê (s.2002). Salên 30-î Radyoya Yêrêvanê beşê zimanê kurdî bi sipîkêrya wê dest bi axaftina xaye ewhn kirye. . .Gelek cîya maraostatî kirye. Emekê wê pîreka jêhatî di kar îî Hecyê Cindî yê zanyaryê da pire. Wê ii raêr malbeteke rewşembîrêye rengîn dora xwe civandibiin. Wanra bîine wek dê-bav, şîretkar îî alîkar. Rewşembîrên usa, ku navê wan her yekî raedenyeta kurdên Sovêta berê dixemilîne. Pênc keç mala wanda mezin bûne: Firîca remetî- Doktora bijîşkyê bîi, dosênt, pîreka zanyarê mezin prof Şekroyê Xudo. Firîde, raamosta matêmatîkayê, fîzîkayê, van salê dawyê wê karekî pir mezin kir, him dayka nexweş xweyî kir, hira jî xebatên bavê - Hecyê Cindî îî yên zilaraê xwe yê remetî, helbestvan Fêrîkê Ûsiv dane weşandin. Keça sisya Zînê, pêşê xweva kîmîk, pîreka berpirsyarê Radîoya 104 Yêrêvanê, beşa zimanê Kurdî, remetyê Ahmedê Gogê. Nûrê, doktora sazbandîzanyê ye, pîreka nivîskar, doktor Tosinê Reşît. (Niha Avstralyayê dimînin). Keça pênc Nazê, pêşekê xwe va mamosta

ye, matêmatîk, pîreka doktor profêsor Feyzoyê Egit, matêmatîkê dinêeyan, serokê para matêmatîkayê ya zanîngeha bajarê Biryanskê ye (Rîisya). Nazê jî niha wê zanîngehê da dersbêje. Em rema Xwedê Zeyneva îvora bixwezin. Bira cîyê wê li rex Hecîyê Cindî (sala 1990 çiiye ser dilovanya xwe), li goristana gundê Pampa Kurda (niha Sîpan), buhuşt be. 01.03. 2007 DERHEQA CERKEZÊ REŞDA Min navê wî cara pêşin sala 1971-ê bihîst. Ez mala bavê xwe da biîm gava cînara wan Sêda Konstantînovna, ku înstîtûta Pêdagogiyê ya ser navê X. Abovyan da seroka kafêdira zimanê dereke bii, hate mala bavê rain îi dilşa go: -Hevalê Hecî, ez hatime çevronayê bidime we. Ciwanekî kurd îro întiyama zimanê inglîsî da ii "5" stend. Paşê me deftera wî ya kifşkirina qîmetê întiyama vekir, me dit, wekî ji her çar întiyama jî ewî "5" stendiye. Xwexwe jî ji gundê Zvartnosêye, femîla wî Çerkez Mstoyan. . .yekî pirr aqile! Bavê min karê xwe hişt, ji ber textê xweyî xebatê rabiî, beşerxweş hate ber bi Sêda xanimê, destê wê ramiisa, go: - Ez zef ji we razîme bona wê çevronayê îi zef şame bona wî xortî. . . Rokê bona karekî ez çîbîîme înstîtîita pedagogiyê. Ber derê înstîtûtê cend lawik sekinî bîm. Yek ji wan hate ber bi min.Min ew nas kir, ew Çerkez bîi. Min ew civîna nivîskarên kurdada îi cend cara jî mala bavê xweda dîtibîi. Ewî go: - Ez Çerkezim, bi çi dikarim alî we bikim? Min go: - Tiştê alîkirinê tune, bavê min naraek daye, wekî bidira dersbêjekî înstîtûtê, dersbêj naka hîviya mine,- îi em hevra çîin, me name da dersbêj. Min wê rojê Çerkezra go:- Ez zef şame, wekî tu dersê xweda pirr pêşî. Çerkez dilşa go:-Lê şuxilê min çîye?. . . 105 Ew bersîv îi beşera wî xweş min bîr nekiryê. înstîtûtêda Çerkez, bo xwendina xweye pirr pêş, pênsîonê bilind îi pirr hunnet ya ser navê Lênîn distand. Pey kutakirina înstîtîitêra, bi dîploma

Sor, Çerkez aspîi-antîirayê da hate qebîil kirinê. Bavê min bû serokê wî yê zaniyariyê. Çerkez paşwextiyê gilî kir, go: -Ez pîrr kubarira, wekî aspîrantê wî zaneyî îi maqulî bûme. . . Apê Hecî, wexta pê hisya, wekî min navê xwe daniye Çerkezê Reş, minra go: "Te qara xwe daye rûyê xwe?";- Çerkez got îi bi dil kenya. . . Hecîyê Cindî du pirtîik derheqa edebiyeta kurdaye Ermenîstana Sovêtiyê da, bi zimanê ermenkî salên 1954 îi 1970-î dane weşandinê. Derheqa xweda, hilbet, nedinvîsî. Lê dema sala 1988-a pirtîika Hecîyê Cindî "Bahar" (veçêkirina zargotina kurda) hate weşandinê, Çerkezê Reş pêşgotina wê pirtîikêda derheqa jîyan îi kar îi barê bavê minda gotareke zanyariye berfîreh bi semavê "Bavê zargotina gelê kurd" nivîsî. Roja parastina têza dokoriyê ya Çerkezê Reş - bavê min nexweş bîi îi destnîvisara bavê xwe derheqa têtêda min îi Nîira xîşk me bir da rektoratê. Komîsiya zaniyara bi yekdengî Dayika min û dostê malheta me, têza Çerkezê Reş pejiwand. . . Fêrîk zef qedirê Çerkez zanibîi, doktorê zanînên fllologîyê Çerkezê Reş. 2003. nivîsareke xweda nivîsyê: "Wê tiştêk ji Çerkez derê".. Du helbestên xwe pêşkêşî wî kirine. Ew helbest saxiya Fêrîkda nehatibîin weşanê îi gava min berevokeke Fêrîk amade dikîi-, min ji Çerkez pirsî: - Ez wan helbesta bikime berevokê? Go: - Ew çi gilî, nivisarên pisraamê min Fêrîkin, miqîm cî bike! Meha çileyê pêşin sala 2003 -a bîi.Çerkezê Reş tevî bermaliya xwe Leyîla xweşik hatibîine dîtina dayîka min. Min Çerkezra go: - îsal 95 saliya ji dayikbiina bavê mine. Min sala 1994-a di 24 hejraarên rojnama "Rya teze"da gotarên "Ji erairê Hecîyê Cindî" dane çapkirinê... Û hê xeber devê minda Çerkez go: 106 - Were em pirtîikekê hazir kin: "Heçîyê Cindî, jîyan û kar", ezê alîkariyê bidime te. Tu wan hejmarên rojnamê bide min, ezê bidime keçika

bera ser kompûtorê berev kin, redaktoriyê jî ezê bikim, ezê pêşgotinekê jî binvîsim...tu bifîkire, eger tiştê zêdekirinê hebe, emê zêdekin...,-go,- çend fotoya jî hazirke, ezê paşê bêim, bivim. Ez zef dilşa biim, min go: - Çerkez can, te semavê pirtîikê çi zî dît. Ezê hema naka wan hejmara bidime te. . . Dayîka min jî kêfxweş bii, go: - Xercê pirtîikê jî ser min....-go,- Çerkez can, de tu zanî Hecî çiqasî te hiz dikir, qedirê te zanibî. . . Û min hejmarên rojnamê dan Çerkez ii ewî jî da keçika îî piştî du- sê meha Çerkez minra go: - Pirtîik hazire, min îdî redaktorî lê kirye îî weşanxanêra pev ketime, ku sibê pirtîikê bivim bidine wan. Em hevra çîine weşanxanê.Gotin: - Deh rojada emê çap kin. . . Û sala 2003-a pirtûka "Hecîyê Cindî, Jîyan îî kar" weke diyarî ji bo 95 saliya bîiyîna Hecîyê Cindî cara yekemîn, bi alîkariya doktor Çerkezê Reş hate weşandinê. Ewî bi xwe pirtîik anîn malê. Dayîka min çîi riîyê Çerkez, razîbîina xwe jêra got. Çerkez bi dil go: - Metê can, ew borcê ruhê mine. . .Ez aspîrantê apê Hecî bîime, qe ez dikarim wî kurdê Mezinî nemir bîrkim? ... Piştira, dîsa wê salê bi alîkariya Çerkezê Reş pirtîika "Ûsiv îî Zelîxe" (Pêşgotin ii pênasîn û ji zarê zarbêja girtina 10 şaxa (varyanta) yên Hecîyê Cindî) me cara yekemîn da weşandinê. Keçeke kurd pirtîik ser kompûtorê berev dikir.Cama rêzên nivîsarê tevîhev dikir. Bahara sala 2004 -a min kompûtor xwera kirî îî hevtêsaliya xweda hînî kompûtorê bîim. Û piştira min ser kompûtorê destnivîsarên bavê xwe ii berhemên Fêrîk berev dikir. Sala 2004 -a min berevoka helbestên, ku Fêrîkê Ûsiv bi zLmanê ermenkî nivîsî bîi îî helbesten wî, yên ku helbestvanên ermenyaye mezin Hovhanês Şîraz îî Hamo Sahyan lê usa jî Çerkezê Reş îî Mîkaêlê Reşîd wergerandibiin ser zimanê ermenkî, amade kir. Çerkezê Reş pêşgofînek bo wê berevokê nivîsî

Îi ew pirtuk bo 70 saliya ji dayîkbîina Fêrîkê Ûsiv bi destî hukümetê hate weşandinê. Ji 18 pirtîika ( eva pirtîika jî serda- 19-e), ku min amade kuine îi 107 dane weşandinê, Çerkezê Reş rêdaktorê 1 1 pirtîika bîye. Her cara pey rasthatinêra ez ser erîdîsya, hereket îi ênêjiya wî şaş îi metel dimam. Cerkez xudanê zanînên ênsîklopêdîk bîi. Mixabin, Çerkez cama pêra nedigîhand pirtîikê tam bixîine, serra-berra dixwend... Çawa pirtûkek dihate weşandinê, digo: -Bira bimbarek be, lê bira eva ne pirtîika dawiyê be. . . Ewî tim helan didane min: "De bifikire, îda çi ma? Mîrata apê Hecî, çi ku pêra negîhandiye bide weşandinê îi yên pismamê min Fêrîk em gere bidine weşandinê, ew borce"... Çerkêz wexta têlê dixist, fîmê digot: -Allo, ezim, roj xêra te. . . Ewî hetanî dawiyê jî navê min hilneda - ne metê, ne xuşkê. Min carekêjê pirsî: - Cerkez can, tu çira navê min hilnadî? Beşerxweş go:- Ez jî nizanim. Yekî usa bîi. . . Dayîka min payîza sala 2006-a malda ket û hestîyê wê cîkî bêfesal da şikest: wî emirê mezin da. Çar meha nava cî nivînada bû. Meha emirê wêye dawiyê bîi. Çerkez Leyîlêva hatibîine mala me. Min wanara got, wekî diya min kesî nas nake, rewşa wê xirabe. Çerkez nêzîkî cî nivînên dayîka min bîi, go: - Metê, ez kîme, tu min nas dikî? Diya min çevê xwe neîseyî vekirin, deqekê, dudiya ser wî nihêrî û hêdî go: -Reşê me nînî? Çerkez zef dilşa xwe avîte pêsîra dayîka min, hate rîiyê wê, go: -Wey, metê can, ezim, ez. . . Dayîka min 26-e meha sibatê sala 2007-a, 93 saliya xweda çîi ser dilovaniya xwe. Pirtîikên bavê min, textê wî yê xebatê, pir pirtûkên pirtîikxana wî Çerkezê Reş bir gundê xwe Zvartnosê.Minra go: Xema neke, bawarke, wekî birê teyî biçûk wê wana zef baş biparêze... Havîna sala 2007-a bîi. Ez, Çerkez îi serokê înstîtiita rojhilatziyê ya Akadêmiya Ermenîstanêye zanyariyê

Rîbên Safrastyan çîbîine bal katib-akadêmîkê Akadêmiya Ermenîstanêye zaniyariyê Vladîmîr Barxûdaryan. Me besa 100 saliya ji dayîkbûna 108 Hecîyê Cindî kir. Akadêmîk Barxûdaryan go: -1 00 saliya bîiyîna zanyarê kurd yê mezin Hecîyê Cindî miqîm emê bidine kifşê. Heta bahara sala tê wext heye, pak dibû derheqa jiyan î karê Hecîyê Cindî da pirtûkeke çûk bi zimanê ermenkî bihata weşandinê. Çerkez go: - Ezê binvîsim, ez aspîrantê Hecîyê Cindî bîime, ez jîyan î karê wî ji jîyana xwe paktir zanim, pirtiik 2-3 mehada wê hazir be bona weşandinê. Em li hev rûniştin û ji oda akadêmîk Barxûdaryan derketin. Rêva Çerkez minra got: - Lî tu zanî, wekî ez naka destana "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî yê Nemir werdigerînim ser zimanê ermenkî? Min kêfxweş go: - Na, welle, mm nizanbii. Silamefî be, Çerkez can, te tişteki şabûnê minra go, hêjeye tu wî karî bikî, bha Xwedê piştovanê te be, ew karekî bihagirane, ez bawarim wergera te wê zef baş be. Go:- Ez bi hizkirin werdigerînim... mehek dinê, gava ew mm xilas kir, ezê pirtûka derheqa Apê Hecîda binvîsim. . . . . Wan meha nava karê wîda dijwarî jêra çê bûbûn, problêmên wî hebûn. . . bi xemgînî xeber dida. Carekê bi têtêfonê got: -Têksta pirtûka derheqa apê Hecîda serê minda hazire, dimîne binvîsim... Tu dikarî yekêra pev kevî, wekî bê mala we - ezê ennenkî ezber bêjim, bira carekêva ser kompîitorê berevke. Jineke nasra ez pev ketim, min Çerkezra jî go, wekî filan rojê û sehetê jinik wê mala meda be. Jinik hat. Çerk.ez nehat, bi têtêfonê baxşandin xwest, go, sibê ezê miqîm bêm . . . î dîsa nehat. . . Min texmîn kir, wekî wê demê karkirin jêra çefîne, loma derengî dêxe,. . . .î min bi têtê jêra got: - Çerkez can, hiz dikî ezê binvîsim û çawa hertim tu redaktoriyê bike... Go:- Baweriya te hebe, min zef dixwest xwexwe bmvîsya, le nizanîm çira lev nayê...

De, birabe, tu binvîse, ezê bbcûnim... Lê sedî sed ezê civênê da derheqa jiyana û karê apê Hecîda dakladê bixûnim. Meha sibata sala 2008-a Çerkez hate mala me, got: - Rewşa rain xirabe... çawabe. Ez dixwezim cîkîda herim, hela wê i.o.i.-^ Min cara pêşin didît, wekî rasfî jî "halê wî tune", belengaz bubu, j 109 pirs tevî hev dikirin... Min qawe anî, vexwer, go: -Emirê min bîiye doje... binvîsim, bixûnim, bifikirim... ez vê gavê nikarim tu karî bikim- Ez ber dilê wîda hatim, min go: - Rojên çetin wê derbaz bin, herin... Boy xwedê be, Cerkez can, tu bêhna xwe fireke, her fîştê pakbe. . . Belê, emirê merivê bi talant, merîfet, pir aqil îî kemal, sed mixabin, pîr çetin derbaz dibe, ewana çawa ku lazime cama ji aliyê nefera, heval-hogirada nayêne fem kirinê, qîmet kirinê, gel jî li wana xwedîderaakeve... U Çerkezê Reş - ew zaniyar îî helbestvanê mezin, welatparêzê dilsoz, ew kurdê xîret, paqîj îî heyf ber wan çetinayên emir teyax nekir îî 20-ê meha adara sala 2008-a, ji zeman zîitir, 53 saliya xweda çîî ser dilovaniyaxwe... Hezar mixabin... WEZIRÊ EŞO ÇEND NÊRÎN Î BÎRANÎN SER HECÎYÊ CINDÎ H. Cindî meremê jiyana xwe di nava xizmetldrina himberî çanda kurdî da didît. ...Ez ser kar û barê Hecîyê Cindî da gelekî kîir û dîir fikirîme û ew weke fenomênekê ditiye. Î ne bi tenê ji ber keda wî ya berhemdariyê, lêkolîneriyê ya mezin, ku zefta şexsekî da nîne, her çiqasî jî ew xwediyê zanînên mezin, êrîdîsiya, hereketê ne dîfî ii nebînayî, yê xurt be. Heger em dikarin wa bêjin, Hecîyê Cindî bi giranî ji ber wê yekê fênomêne, ku ewî ew kar û barê nivîskariyê, zanyariyê, pêdagojiyê îî bi gişfî ronakdariyê pişfî wê yekê jî bi xurtî, bi hêz berdewam kir, gava rast salekê hebixana KGB da hate zêrandinê îî îşkencekirinê, ji nava kîjanê degme mu-ov zêndî yanê jî silamet, yalê tundurustiya fîzîkî û pisîkolojiyê da tamam



derdiketin îî, pişt ra jî, bi zemanekî dirêj, heta mirina Stalîn, jiyana xwe li ber tehlika girtinê, îşkencekirmê û sirgînîkirinê îî belkî gullekirinê buhurand îî bi ser da jî nava tirs ii xofa boyî wê yekê, ku neferên wî jî dikarin qedera wî 110 parevekin. Belê, li ber vê tehlika rêal, di nava atmosfêreke pir giran da jî Hecîyê Cindî kar îî barê xwe yê xizmetkirina himberî çanda milletê xwe da berdewam kh. Pişfî fikandina zemandirêj ya ser fênomêna wî awa ez hatim ser çî encamê îî bi tecrîba min ya here rast. Hecîyê Cindî xudanê cesaret ii îrada xurt bîi, hetanî warekî jî ya nedîfî îî nebînayî. Hemûşk haj pê hebîin, ku ewî ber îşkencên kan-nendên KGB yên here giran jî, ku pişfî wê yekê ew sîicê nekirî hilgire ser milêii xwe, li xwe mukur bê - ewî ew yek nekir îî ne ku bi tenê zêndî ma, lê bipêrajî serbilind. Bilî cesaretê mezin ii îrada xurt faktoreke dinê di vî warî da roleke mezin, hergê em nebêjin- bingehîn leyîst. Hecîyê Cindî yê miletevîn û welatevînê mezin jiyana îî dîroka gelê xwe ji xwe ra khibû mîsala çevlêdanê û jêfêrbûnê, ew yek ku di nava temamiya dkêjaya dîroka xwe da gelê kurd ber zor îî zuhna dijmina neşikestiye, bi ser da jî ber xwe daye û jiyana xwe hêjî berdewam dike. Ber vê yekê jî, ew difikirî, hêjaye, ku ew weke lawekî wî geh xizmeta çanda wî bike, ku ew vir'hada jî ser piyan bimîne. A hema ev nêt û merem bîi sebebê bingehîn yê neşkestina Hecîyê Cindî, sebebê wê yekê, ku ew kar û barê xwe di wî warî da berdewam bike bê meriimbîin, feqîrbîina li ber hemû tehlîkên giran. Hecîyê Cindî dihesiband, ku mîsiyoneke wî ya mezin heye: xizraetkirina himberî gelê xwe îî çanda wî da.Û ji ber vê yekê jî, heger em dikarin bi vî awayî bêjin, îzin, destûra wî tune beriya bi cîanîna wê mîsiyona pîroz ew bişkê. Era dikarin vê yekê bi awamî dinê jî bêjin. Xiyal û mexseda bi kêrhatina xwe bona milletê xwe û

çanda wî ne ku bi tenê Hecîyê Cindî ser piyan dihişt, lê bi pêra jî hêzeke pehlewani dida wî. Weke rûniştevanekî Yekîtiya Sovêtiyê ya berê û zanê dîroka wî welafî, bi ser da jî agahdar û şedê zor û zulma desthilata Sovêtiyê ya totalîtariyê himberî gelên welatê xwe da ez bi bawerîke teraara dikarim wa jî bêjira: heger Hecîyê Cindî weke pêsonajekî hikyateke kurdî Canpolad ne ku ji goşt û xûnê pêk hatibûya, lê bi bedena xwe serdapê ji pola bûya jî, ew polayê bimaşiya û bihelya. Lê heger ruhê Canpolat nava gêziyê, sivnikê da bû û gava yên ku ji wî ziyar dîtibûn yanê jî dîtina zirareke mezin ji destê wî dithsiyan, li wê surrê hisyan û bi şewitandina wê gêziyê mhê Canpolad jê stendin, lê ruhê Hecîyê Cindî di nava pktîkên wî da bû, yên ku nava xelkê û pirtûkxana da haqas bela bibûn, ku bi carekêra şewitandina wan ne mîimkiin bû. Bi ser da jî em wan pirtûkan dikarin bişibînin zarokên wî yên şîrhelal, ku ^ . 111 gava, weke dibêjin, fira dikevin, mezin dibin li bavê xwe xwedî derdikevin, xizmetkirina himberî bavê xwe yê kalemêr da bi şêkirandina emekê wî yê ser xwe hildigrin ser milên xwe. Pirtîkên Hecîyê Cindî yên berhemên geleri, edebyeta bedew ii zaniyarî hêzeke mezin didan xudan-efrandarê xwe, berxwedana wi bi hêztir dikirin. Bi wan pirtîkan û ewî tecrîbe wê fikir, ku xwe jiyana bide wî cîkî boş û betal - ne nebhuriye, poşmane, heger jiyana rihîna gelê xwe ber ku meremê jiyana xwe di nava xizmetkirina himberî çanda kurdî da didît. Ev nêrîna wî ne ku bi tenê bîi sebebê zêndîmayîna wî yê bingehîn, lê her usa jî sebebê wê yekê, ku piştî dîtina zor û zulma giran ewî karê xwe yê berhemdariyê bi hêztir berdewam kir û bi dehan pirtîkên nîi, bi sedan gotarên zanyariyê yên teze pêşkêşî çanda gelê xwe kirin. Girêdanên malbetî navbera malbata Hecîyê Cindî û ya mala bavê

min da yên nêzîk hebîin. Meta mine Meyane, qîza Xezala Hemo ser Hecîyê Cindî dişewitî, jê hiz fikir, ber ku dayîka wê -Xezal, meta dayîka Hecîyê Cindî bîi- Zozanê bîi. A ji ber vê yekê biî, ku Hecîyê Cindî jî yalê xwe da rêz û hurmeteke mezin meta mine Meyanê ra digirt. Her carekê, gava meta mine Meyane ii mêrê wê Eloyê Êsiv, ku li Tivlîsê diman, dihatin Yêrêvanê serlêdana me neviyên birê xwe- Şîralî, Lûsîkê ii min, hê pakî ji westandina riya dîir hêsa nedibû, dew ji me fikir, ku em wê bibin mala Hecîyê Cindî, dîtina wî î zarokên wî. Hecîyê Cindî bi dîtina meta mine Meyane ra gelekê kêfxweş dibû, ber ku weke bîna dayîka xwe jî ji wê hildida. Bi saya karaktêrê rathatineke Hecîyê meta min, Cindî mêrê ji wê Eloyê Êsiv û Hecîyê bi cîrê Cindî fotokî bîranînek, îzbatek xweşik maye, ku me bi pêşniyar î Rûniştûji çepê milê rastê: daxweza Hecîyê Cindî di atêliyeke Yêrêvanê da da çêkirinê. Dema H. Cindî, Meyana Reşîd, Eloyê Êsiv; (pişva): Lûsîka Eşo û Wezîrê Eşo, S.1975. çêkirina vî fotoyî ez û xayînga xwe -Lîsîk jî li tenîştî wan amade bîin. 112 (Meta Meyane - xiişka Hutî begê û malxwê wê apê Elik (Elo), ku bajarê Tbîlîsiyêda diman, mêvanên mala bavê mine pirr hizkirî û pirr qedir bûn, qewim û welatîyê bavê min bûn.-F.H.) Ez bîim riiniştevanê Yêrêvanê Gava min sala 1953-a dibistaneke Tivlîsê ya ei-menî ya navîn tamam kir biryar hat stendî, ku ez perwerda xwe Zanîngeha payîtextê Ermenîstanê-Yêrêvanê da berdewam bikim bona bi destxistina xwendina bilind. Ê di vî warê bi cîanîna vî raeremî da dayîka rame gorbuhuşt serkêşî fikir. Êwê dibistana sêwîxanê ya xwendina êlêmêntar da perwerda xwe stendibû, ber vê yekê jî qedir- qîmetê xwendinê ji gelek dayîkên dinê bêtir zanîbîi. Ez hatim gund (Pampa berê), mala bavê xwe, ku ji wira herira Yêrêvanê, dokîimanên xwe

teslîmî Zanîngehê bikim. Dayîka min da pêşiya min îî em dîrêkt çûn mala Hecîyê Cmdr Dayîka min ya, ku haya we baş ji hêz û hunurê Hecîyê Cindî wê yekê hebû, ku bi mesrefkirina nav îî riimeta xwe ya bilind ew dikare alîkariyê bide ji bona qebûlkirina min Zanîngehê da, jê ra got: -Hecî, Wezîrê min Zanîngehê da qebûl be jî te kiriye- qebûl nebe jî dîsa te kiriye. Hecîyê Cindî, ku. beriya wê gotina dayîka min ji bona hatma me pir kêfxweş bibû bi carekê ra xemgîn bû. Pişfî deineke kerbûnê ewî ji dayîka min ra got: - Karê, ez weke te û Eşo, weke Elo û Meyanê dixwazn Wezîre min Zanîngehê da bê qebûlkinê. Tiştê zefta min da be, ji destê rnin bê- ez wî tişfî tehsîr nakim. Ezê ji bona xatirê te û Wezîrê xwe temamiya hêz îî hereket, rûmet û navê xwe mesref bikim, lê gava zefta min derbe, ji destê min neyê bera xeyîda te tune be. -Hecî,- diya min dest xwe da ser gotina apê Hecî da anî, - navê te, şikir haqas bilinde, rûmeta te bal serokên Eraienîstanê haqas mezine, ku naqewune xwestina te bi cî neyînm. -A reme li dê û bavê te be,- apê Hecî ser vê gotina dayîka ram kêfxweş bû û jêra got,- te rind got. Ez çî ji we veşêrim, rûmeta rain pirî-hindikî heye, lê dîsa jî gelek tişt Wezîrê min ra girêdaye. Ew gofî çend întiyaraa bide, lê qîmetê haqas bilind ji wana bistîne, ku ji konkûrsê derbaz be û bê qebûlkinê. Lê konkûrs jî mezine, haqasî mezin, ku ji sê- çar xort û keçan bêtir her bi tenê yek bê qebûlkumê, 113 yê ku balên herî bilind qezanç kiribin. Lê ez dewa wê yekê jî nakim. Bera Wezîrê min her bi tenê ji întiyama neyê birînê, qut kirinê. Gava ew ji intiyamekê qîmetê "2" bisfîne bi otomatîkî ji berdewamkirina întiyamên dinê tê qut kirinê, yanê gofî, Xwedê nekirî, dokûmanên xwe ji Zanîngehê hilde îî şîinda vegere mala xwe. Lê gava neyê birînê, "2" nestîne ii hemû întiyamên xwe bi qîmetê "3" jî bide wê

çaxê ewê firsandê bide, ku ez dîi karê wî bigerim, ku wî Zanîngehê da bidime qebîlkirinê. Ezê wê gavê temamiya hêz îi hereket, riimeta xwe mesref bikim. Ezê herim hatanî bal serokê Komarê jî, jêra bêjim, ku kadroyên me kurdan kêmin, zimanê ermenî jî ne zimanê me yê zikmakiye, ev zilamê me ji întiyaman nehatiye birînê, lê dîsa ji balên wî têra qebîlkirina Zanîngehê da nakin. Ji ber vê yekê jî ez weke ronakbû-ekî kurd ji We rica dikim, ku hîin wî dervayî sînorê konkîrsê, weke lawê miletekî Ermenîstanê yê kêmjimar, Zanîngehê da bidin qebîlkirinê. Ez bawerim, ku ewê ricakirina min bigire ber hesêb, riimeta min erdê nexê îi Wezîrê min Zanîngehê da bide qebîlkirinê. A eve rasfî, xayîngaminehêja. Lê dayîka min serhişkî kir îi gotê: - Hecî, ez ji wê konkîrsê, van balên, ku tu dibêjî tiştêkî fem nakim, lê her bi tenê zanim, ku heger tu qedir riimeta xwe nehêvişînî Wezîrê minê Zanîngehê da bê qebîlkirinê. Dema derketina me ya ji mala Hecîyê Cindî ewî ji minra got: - Dayîka te diçe gund, weke te got, tu li vir-Yêrêvanê dimînî. Tu îdî raala me nas dîkî, sibê pişti nîvro were mala me emê ser kar îi barê te careke dinê biaxivin. Weke em pevketibîn, sivetirê zemanê kifşkirî da ez çîim mala Hecîyê Cindî. Ewî ji minra got: - Wezîrê min, ez bextê te dame, weke dibêjin, xwe bişidîne van rojên beriya întiyaman îi navbera întiyaman da şev îi roj bike yek, bixîine- binivîse, dubare bike, ku qet nebê ji întiyaman neyêyî birînê û pêşîra min ji destê dayîka xwe bidî dencistinê. Netirse, minetê negire, apê te li vke. Ezê tiştêkî jî ji te rica bikim. Gava te întiyamek da îi ji avayê Zanîngehê derketi, bêyî mala me, yan raala mera têlêxe bêje, kanê te ji wê îmtiyamê çi qîmet stend. Ez evê ber wê yekê dibêjim, ku heger, Xwedê nekirî, hi "2" bistînî, ji întiyamê bêy birînê- ezê zu xwe Zanîngehêra bigihînim ii belkî

bikaribim îmtiyama te careke dinê bidun qebiîlkinê. Lê gava qîmêtê baş jî bistînê dîsa têlê da me agahdar bike, ku dilê me rehet be. 114 Şansê min anî, ku ez qet li îratiyamekê da jî ne hatim birînê. Hela bi serda jî rain qîmetên herî bilind qezanç kirin. Gava min bi têlêfonê ev mizgînê li apê Hecî dadixist ewî digot: -Eferim, Wezîrê min, şîrê te li te helal be, te pêsîra min ji destê Karê derxist. De were, ez î Zeynev benda tene. Û min berê xwe dida mala apê Hecî, şabûna teyê qey bigota lingê min li erdê nagirin, ez nava hewê ra diçim, difîrim. Gava ez digihiştim mala wan, apê Hecî digote meta Zeynev: - Zano, de bîne çî xwarina te ya xweş heye bîne dayne ber Wezîrê min, bera bixwe, lê helal be. Ez Zanîngehê da hatim qebiîl kirinê î belkî ji dê û bavê min jî bêtir Hecîyê Cindî şa bî. Ez çawa wî apê xwe yê ezîz bîr bikim! Lê gelo ew tenê dilê rainda ezîze. Na, ber ku wî alîkariya gelek xort î keçên kurdan yê dinê jî kir, ku ew xwendina bilind bi dest bînin û bi kêrê çanda me, bi kêrê civaka kurdî î bi gişfî jî civaka Ermenîstanê bîn. \*\*\* Carekê, gava ez îdî xwendkarê Zanîngeha Yêrêvanê biira, dayîka mine Karê tevî bîrê ji min biçîktir-Şîralî hatibû Yêrêvanê ii bibî mêvana mala Hecîyê Cindî. . . Dayîka min Karê apê Hecîra got: -Hecî, Şîraliyê min dibistaneke şeherê Tivlîsê ya msî da hîn dibe ii her bi tenê qîmetê herî bilind - "5" disfîne. -Ûsane,- apê Hecî got,- bi van hest ii hisên nazik î bi vî firasefî mirov, kadrekî mezin î kêrhatî wê ji wî çêbe. Gotina Hecîyê Cindî yê xudanê tecrîba mezin bi cî hat. Şîralî pişfî temamkirina însfîtiita Yêrêvanê ya dixtiriyê 20 sala bû serokê beşa xîriirgiyê (cerhayê) ya nexweşxana bajarê Sipîtakê li Ermenîstanê, çend hezar mirov operasiya, emeliyat kirin, têza xwe ya doktorayê amade kir, lê erdhej, zezela sala 1988-a mirazê wî î keça wî- Leyîla wek horî- melean ya 16 salî di çavên wanda hişt, ew şehîd

ketm. Şayîrê kurda yê mezin Ferîkê Ûsiv nivîsek, helbestek îî çend çarînên bi şêwat avîtin ser şehîdbîina Şîralî îî dota wî. Bilî çapbîina di rojnaman îî pirtiikan da, bilî kolandina wan bi fîpên (herfên) zêrîn ser hêkelê Şîralî û Leyîlê ew berhemên Fêrîkê Usiv yên giranbiha bi destiivîsar (destxeta) şayîr bi xwe, lê her îisa jî bi dengê wî, bi xwendina wî, ku li ser kasêtê hatme qeyîd kirinê, di -" 115 inal-mûzêîima Şîraliyê Eşo îî arşîva wî da wek tiştên pîroz îî tiberkî tên parastinê ji bona nivşên dîihatî. H. Cindî govend dida amadekirinê bona sivikkirina giraniya hisreta dilê xwe. Hecîyê Cindî her çiqasî jî întemasyonalîst bû, lê bi giranî kurdekî xalis îî xwerii bû, weletevîn îî miletevîneki bi şewat îî amin, mirovekî helal himberî rehê xwe yê bav îî kalan da. Her çiqasî jî ewî olka xwe ya herêma Qersê, ku bi tevaya xwe va wî û qersiyên dinê weke welatê xwe dihesibandin îî weke welat bi nav dikirin, pir zîi unda kir, ku pişti-a weke xewneke şeva bîr danî, lê hisret- kovana wî welafî, mirovên wê hetanî dawiya jiyânê ew êşandin û xemgîn kirin. Em ronakbîrên kurd, lê payê pirê ez îî lawikên qewmê xwe yên ji Pampê, ku li Yêrêvanê diman, diçîin mala apê Hecî bona pîrozkirina sersala wî îî neferan, yanê jî pîrozkirina xelateke dewletê ya bilinde bi riimet, ku ew ji ber keda xwe ya mezin hêjayî wê dibîi. Meta Zeynev bi kêfxweşî sifi-a nas- nemetên pircûrê li ber me radixist Me zemanekî dhêj li wir dixwar-vedixwar îî kêf dikir. Û ji nişkêva apê Hecî navbirî dida xwarin-vexwarin, sohbeta me, radibû ser piya îî digot: - De niha jî rabin em govendeke kurmancî bigrin. Ewên mêvan, hemîi keçên wî, hemîi zavayên wî, yên ku li wir wê rojê amade bîina, radibîin îî me govend digirt. Dengbêjên me yên serekîn apê Hecî îî meta Zeynev bîin. Ewana dest bi stirana reqasê ya "Leyîlê, Leyîlê, Leyîlê xanê" dikirin îî ji me

jî dudiyan li wan vedigerand. Gava govend çend fitlan digerî û dawî li vê stiranê dihat, vê carê wana klama "Keleşo, nobedaro" distiran. Me dîsa li wan vedigerand. Lê vê govendê, vê reqasê da em hemîşk beşerxweş dibîin bilî apê Hecî. Ewî distra, lê bengz îî bala wî xweş nedibîi, distra, lê bi avirîi, nêrîna xwe ne li bal me, ne li oda xwe bû. Wî gelekî dîir, pêşberî xwe raêze dikir, te qey digot avirîi, nêrîna wî dîwar qul dikir îî diçîi welatê wî yê wî afî sînorê sîirkirî, diçîi gomeke gundê wî- Emençayîra rengîn, li kî derê mêrên simêlpalik, jinên bi şer û şemaqiya, bi rext îî moriyên karibar xemilandî govendeke berfireh girtibûn, bi deng îî awazên def îî zoma kurmanciyê da xwe kêlek- kêlek dişkênandin îî bin kaw îî kubar direqisîn. Pişfî pu- salan, pişfî mirina Hecîyê Cindî jî, gava îro ez bi xwe bîime kalemêr îî ketime xerîbiyê, haştk û zelaltir mexseda wî dilbirînê 116 welatê bav ii kalan dibînim îî rasttir dinirxînim. Hecîyê Cindî ev govend dida amadekirinê ne haqasî ji bona şabûnê, lê çiqasî ji bona sivikkirina giraniya hisreta dilê xwe îî bi cîanîna berpirsariya xwe himberî çanda gelê xwe ii bi tayîbetî erf îî edet, raw îî rizmê wî da. Lê, hilbet, raexsedeke wî ya dinê jî hebîi: zarokên xwe fêrî stran îî reqasên miletiyê bike îî wana nava ruhiyeta wan da kîir bide rîniştandinê. Lê ez her bi tenê bi yekşivêtî îî bê şubhe tişteki nîkarun bêjim: gelo Hecîyê Cindî bi wan stranan, bi wê govendê îî reqasê mal û malbata xwe dibir Emençayîra kovana dilê xwe yan Emençayîr ji herêma Qersê danî dixiste oda xwe ya li Yêrêvanê? "Gava te hildaye lêve, ez zanim çî li dêve". Bîranîneke pir balkêş ii bi yîmorê dagirtî derheqa Hecîyê Cmdî da, lê vê carê ne ya min. Ew bîranîna çend heval-hogirên min yên ronakbîre, ku ez niha tînim navê îî ew cara yekemîn tê tomarkirmê îî weşandinê. Çend ronakbîrên me beriya min çîibîin



Yêrêvanê îî di zanîngeh îî înstîtiitan da hatibûn qebûlkirinê. Ez piştra çiiim gihiştim refê wan. Rojekê, gava çend kes ji wana rastî hev tên, li hev dicivin, ez nizanim kî ji wana vê pêşniyarê dike: - Gelî lawika, me zîiva apê Hecî ne dîtiye, em neçin dîtina wî? Hemîişk bona vê pêşniyarê şa dibin, ber ku dîtina yekî weke Hecîyê Cindî ji bona wan bi rasfî jî şayî ii şabîin bîi. Pişfî her dîtineke bi mezinayî, çiyakî weke Hecîyê Cindî ra, ku gotin îî şîretên bi fikra kur jê dibarîn, ewana xwe aliyê zanînan da dewlemendbîiyî didîtin û bi pêra jî kêficwaş îî serbilind, ku mezinayîkî weke wî bi wanra rîniştiye, sohbet kiriye îî ya here mîihîm, ku rêz ii hurmet ji wan ra girtiye, bi wana şa bîiye, her çiqasî jî temenê xwe da ji wana mezintir ii ji wana zanetire. Belê, lawik hev digirin ii berê xwe didin mala Hecîyê Cindî. Di nava wanda bîine Sehîdê îbo, Simoyê Şemo, Şikoyê Hesen, Şerefe Eşir û îlîçê Reşîd. Ewana ew kes bîin, yen ku pişfî-a biin ronakbîrên kurd yê bi kemal, bi nav û dengê bilind û bi wana jî Hecîyê Cindî her tim kêfxweş îî serbilind dibîi: Sehîdê Îbo îî Şerefe Eşir doktorên zanînan û profesor, Şikoyê Hesen û Simoyê Şemo şayîrên xweyê talant, kemala mezin, îlîçê Reşîd- rojnamevan îî karmendê dewletê. Ewana pir caran ev çîiyîna xwe ya li mala Hecîyê Cindî ii bîiyera li wir çêbîiyî bi hisret îî kêfxweşî, bi rêz û hurmeta mezin himberî wî mezinê xwe bîr danîn. Awa di mala Hecîyê Cindîda çî axavtin, çî 117 biiyereke întêrêsant çê dibe. Gava ew derê mala Hecîyê Cindî vedikin, evê te weke xwe hercar bi şabîin wana qebûl dike îî gorî karaktêrê xwe yek bi yek ji her kesekî ji wana pirs îî pirsiyara ser xwendin îî karê wan dike. Piştî ku lawik bersiva pirsiyarên wî didin, Hecîyê Cindî dibêje: - Sal bi sal hiîn him yalê zanînan da û him jî yê temen da pêş dikevin, mezin dibin. A Sehîd,

Simo îî Şikoyê min gava nîi hatibîin Yêrêvanê, ser xwendmê - golik biin. Piştra biin mozik, lê niha îdî ciwanegene. Lê Şeref û îlîçê min sala yekemîn golik bîin, lê niha mezin bîine gihîştine îî bîine mozik. Gava Hecîyê Cindî vê gotina xwe tamam dike, vê carê, gorî karaktêrê xwe bi aviriyên tîj li çevên lawika mêze dike îî dibîne, ku kêfa temama bi vê gotina wî ya henek îî laqirdî xweş bîi, hemiîşk kenîyan bilî Şikoyê Hesên. Lê weke Hecîyê Cindî bala xwe didê îî dibîne, evê te ciyê xwe da nasitire, xwe li ser kursî her wa kêlek- kêlek dişkêne, weke mirovekî, ku bi sebebekî ji bona wî nê eyan taba wî nayê. Şiko wa xwe çend cara dihejîne, dikilê, difirikîne îî ber xwe da bi şermokefî îî bi awakî tirs û xof, bi dengekî nûnz dibêje: -Lê apê Hecî, lê apê Hecî. . . Hecîyê Cindî bala xwe didê, ku Şiko dixwaze tişteki jê ra bêje. De, Hecîyê Cindî bîi, lê ne, weke dibêjin, mirovekî tewekel, dest xwe da ser va diçe, kanê Şiko çi dixwaze bêje îî deyî li wî dike: - Şikoyê min, weke ez dibînim, ta dixwazî tişteki bêji, lê nizanim çima ji min qursax, cesaret nakî wê gotina xwe eşkere bikî. îdî çima wê gotina xwe devê xwe da dimizmizînî, xwe didî cefe. Minetê negre, eşkere bike, ez mêrê xeyîdê nînim, ne jî ew mirovim, ku ji min bitirsîn. - Apê Hecî, apê Hecî...- Şiko dîsa weke berê derê gotina xwe vedike, lê tamam nake. - De wekî tu gotina xwe tamam nakî- ezê vê gavê şuna te ewê tamam bikin,- apê Hecî jêra dibêje îî gotina xwe berdewam dike, - Şiko, tu haj pê heyî meseleke gelê me yê aqilbend da çi tê gotinê? Heger tu wê nizanî, te ew nebihîstiye- ezê ji te îî we hemîyan ra ewê bêjim. Wê meselêda tê gotinê: "Gava te hildaye lêve, Ez zanim çi li dêve". Tu dixwazî bêjî: "Apê Hecî, lê tu bûyî çi?.." bona tu gelekî kamço nebî awa ezê ji te îî lawikan ra bêjim: Ez jî ciwanege bûm, lê niha bûme ga. 118 Ser vê gotina Hecîyê

Cindî kenek li Şiko îî lawikan digre. - A usa, ji xwe ra bikenin, ez şame, ku min bi vê gotina xwe hûn dilxweş kirin, dane kenandinê. Ya mîihîm ji bona min eve. Belê, Hecîyê Cindî temamiya jiyana xwe da her wa hewil dida dilê mirovan xweş bike, wana bide şakirinê. Piştî vê bîiyerê ev lawikên me li kî derê jî biqesidiyana, lî kîderê jî hev biciviyana, ev gotina Hecîyê Cindî danîn navê, dubare dikirin îî ji nû va kêfxweş dibûn îî pêra jî serbilind dibîin, ku mirovekî usa mezin bi wan ra riiniştiye, ew weke hogirên xwe dîtine îî ber vê yekê jî bi wan ra henek îî laqu-dî kirine. \*\*\* Lê her gava nîbû, ku Hecîyê Cindî her bi tenê kêfa mirovan xweş dikir îî henek îî laqirdî dikirin. Ew di hinek waran da pir ciddî îî seriyoz bû, ber ku ji derewan, bêterbiyetiyê hiz nedikir. Ê ber ku himberî her kesî berpirsariya xwe bi rêk îî pêk bi cî danî, rêz îî hurmet himberî her kesî dîhar dikir-ji wan her kesan jî dixwast, ku ew jî himberî wî berpu-siyariya xwe bi rîimet îî tamamî bi cî bînin. Hecîyê Cindî, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, xudanê kiUtiira biUnd bii, bi serda jî mirovekî pîinktîial, yanê: her karek û her beipirsiyarîke xwe zemanê pêwîst da bi cî danî, rûmeta zemin zanibiî îî ew vik û vala nedibuhurand. Vê kîiMra bilind, ve pûnktiîahyê jî ew kir zaniyar, nivîskarê mezin. Heger vî karaktêrê wî nîbîiya dijwar ew karê berhemdariyeyî mezin, yê têra çend ronakbîrên berhemdar, bi cî baniya. Haya hemû ronakbîran ji kîiltîira îî pîinktûaliya Hecîyê Cindî hebii û kesek ne dicerisî wê kûltîirayê û pîinktîialiyê biteribîne. Ê, awa, bi çî awayî haj wê yekê hebûn. Carekê Hecîyê Cindî bi ronakbîrekî me yê ciwan ra pev dikeve, ku ji bona bi cîanîna karê wî ronakbîrî ew nava bajêrda, cî îî zemanê kifşkirî da rastî hev bîn. Zemanê kifşkirî da Hecîyê Cindî tê li wî cîi ii benda wî ronakbîi-î disekine. Li katjimêre (sehetê) mêze dike, ku pênc deqe

ji zemanê kifşkirî derbaz bûne, lê ew ronakbîr hê kifş nebîye îî ji dûr va jî xanê nake, ji wira diîr dikeve, tê mala xwe. Piştî sêhetekê zengilê têlêfonê lê dikeve îî Hecîyê Cindî radihêje tetika wê. Dengê wî ronakbîrî lê tesele dibe yê ku jêra dibêje: -Apê Hecî, ez hatim ciyê kifşkirî, lê tu ne li wir bûyî. -Ez li wir bûra,- Hecîyê Cindî bersiva wî dide,- lê tu nehata îî ez hatim mala xwe. - Apê Hecî,- ronakbîr dibêje,- ez deh deqa dereng ketibîim... 119 Apê Hecî axaftinê devê wî da digire, dibêje: - Lê baş nedibî, kii tu deh deqa ji zemanê kifşkirî zîtu- bihatayî? Hêja ronakbîr kêmasiya xwe li xwe mukur tê û dibêje: - Tê bibaxşînî ji bona derengîketina min, apê Hecî. -A gotî te destpêkê da îisa bigota. De bira eva yeka tera bibe ders, careke dinê min li cadê benda xwe nehêlî... Hemî kes û bi tayîbetî hemii ronakbîi-ên kurd bi vê yekê hesiyan îî piştî vê kesî ji wana cesaret nekir, ku ji zemanê bona rasthatina tevî Hecîyê Cindî kifşkirî derengtir here ciyê rast hatinê. Bi vî awayî Hecîyê Cindî nemaze ronakbîrên me yên ciwan fêrî pîinktiîaliyê kirin. Ronakbîrên kurd yên nifşa duyemîn Heraii ronakbîrên kurd yên ji nifşa min, ku xwe li xizmetkirina ber kurdzaniyê, edebyet îî çanda kurdîda girtin îî di wan waran da pêş ketin, nav îî dengê bilind qazanç kirin, gotî xwe minetkar û berpirsiyarê Hecîyê Cindî ii ronakbîrên ji nifşa wî bibînin û didîtin jî. Belkî jî em ronakbîrên kurd yên nifşa duyemîn li Ennenîstanê nebîina jî xizmetkarên edebyet û çanda kurdî, kurdzanîne, heger yên weke Hecîyê Cindî îî hogirên ji nifşa wî tune bfma, yên weke Erebê Şemo, Cerdoyê Genco, Emîne Evdal, Casimê Celil, Wezîrê Nadiri, Qanatê Kurdo, Nadoyê Xudo Maxraûdov û yên dinê. Ewana nîbûna emên ji nifşa duyeinîn biketana nava valayîkê îî tu tişteke li pêş çavê rae tune bîiya, ku me xwe lê bigû-fa îî em bibûna ronakbîrên

berhemdar di warê çanda kurdîda. Ronakbîrên ji nifşa yekemîn ji bona yên ji nifşa duyemîn biîn rêveku- îî mîsala jêfêrbîinê îî çavlêdanê. Emên ji nifşa duyemîn me îdî weke wan zehmet nedît, weke wan çev neda ronakbîrên biyanî, me çev da van ronakbîrên xwe yên kurd. Ewana ji boy me ne ku bi tenê bîin rêvekir, lê bi serda jî mamosta. A ji ber vê yekê ez jî xwe weke şagirtêkî Hecîyê Cindî û hogirên dora wî dibînim. Hecîyê Cindî tenê bi berhemên xwe yên edebiyeta bedew îî nemaze yên kurdzardyê ji min ra nebî çavkaniya jêfêrbîinê, mamosta. Ji ber ku, riya min jî ya berbi mala wî hertim vekirî bîi, ji ber vê yekê jî bih berhemana karkirina wî ya piraktîk jî, karaktêr îî rabîin-rîiniştîna wî jî rain ra bûn mîsal u çavkaniya çevlêdan îî jêfêrbîinê. Hemîn şîretên wî jî şûna xwe da. Ê min her wa hewil dida xwe, ku bibim ronakbîrekî weke wî, û, çî ji xwendevanên xwe veşêrim, weke wî 120 riiraet îî nav û dengê bilhid qazanç bikim. Ê gava li ser vê oxira qenç ez digihîştira destkeftin û serkeftinên baş- ew bi min ra pir kêfxweş dibî û bi pesinandina rain ez mhdar dikirim. Ez di warekî dinê da jî mînetkar, deyîndarê Hecîyê Cindî me. Min dawiya salên 70-î biryar danî nava Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê da wek endamê wê rêxistinê bêm qebîlîkirinê. Lê ji bona wê yekê pêwîst bii, ku sê endamên wê Yekîtiyê kêfildariyê, rêkomêndê bidin min. Gava min daxwaza vê rekomêndê ji Hecîyê Cindîjîkir, ewîgot: - Ezê bi kêfxweşî wê rêkomêndê bidim te, tu bi berhemên xwe bi temamî hêjayî vê yekêyî, ku bibî endamê Yekîtiya nivîskaran. Ez di nava wê rêxistinê da hatim qebîlîkirinê. Ez xwe pir serbilind dibînim, ku zemanekî usa jî hat, gava bilî şagirtiyê ez bîim hevkarê zanyarekî, mezinayîkî weke Hecîyê Cindî. Weke gelê me dibêje, çî dêmeke, ku mirovek bibe rêdaktor serrastkirê berhemên yekî weke nîveka

salên 60- Hecîyê Cindî. Bi pêşniyara wî bi xwe ez ji î da bi çend dehsaliyan bîim redaktorê "Elîfba" Hecîyê Cindî. -Wezîrê min,- rojekê ewî ji min ra got, - te zaroti îî xortaniya xwe payê pu-ê gundê kurdan da buhurandiye ii di warê zimanê kurdî da meteke weke Meyana Reşîd dersdara te bîye. biryar daniye, ku tîi bibî redaktorê "Elîfba" min. Ber vê yekê jî min Heger tu di nava wê pirtukê da dîi- sê peyîvan jî serrast bîkî, şuna peyîveke ne haqasî di cîyê xwe da peyîveke baştir daynî, ezê gelekî ji te razîbim. Dîi gotin derheqa "Elîfba" Hecîyê Cindîda, ku ji bona zarokên kurd ewî bi hizkirineke mezin zêdeyî nîv sedsaliyê amade kir. Çend sala carekê ev "Elîfba" ji nû va dihate weşandinê îî ne ku weke xwe berê, lê bi guhêrandin, tamkirin îî tamamkirinên Hecîyê Cindî. Ewî di nava salan da ew her wa serrast dikir, weke dibêjin, şimsat dikir îî ber vê yekê jî di nava pirtîikên fêran da, yên ziman îî lîtêratiira kurdî ev "Elîfba" ya here baş bii. Ez ji ber tiştêkî dinê jî xwe pir serbilind dibînim û pêra jî dilbaristan ji ber vê yekê,- ku min warekî dinê da jî xizraeta wî meznayê çanda kurdî kiriye îî dilê wî gorbuhuştî xweş kiriye. Min bi mîinesebetên rojbîiyîna wî nivîsandina gotarên xwe ser jîyan û kar îî barê Hecîyê Cindî yê nivîskariyê îî kurdzaniyê bi cî aniyê îî zêndîtiya wî da ew di rojnama Rya Teze îî yên ennenî da dane 121 weşandinê. Pişti wefatkirina wî jî min ev kai- îî barê pîroz berdewam kiriye, gotarên berfireh di rojnaraa, kovar îî berevokan da dane çapkirinê. Bilî wê, bi alîkariya dota gorbuhuştî ya hêja Firîda Cewarî nivîsên min weke peşgotinên pirtîikên Hecîyê Cindî jî hatine weşandinê. Gotareke min ya berfireh jî bi zimanê ermeni wê berevokê da hatiye bi cî kirinê, ya ku bi mîinesebeta 100 saliya bîiyîna ronakbîrê mezin li Yêrêvanê çap bîye. Ez îdî derheqa wan gotarên xwe yên ser Hecîyê Cindî da nabêjim, yên ku

rojnamên kurdî yên dervayî Sovyetistanê da hatine weşandinê îî bi malperên kurdî yên êmayîlê hatine belavkirinê. Hecîyê Cindî ahkar û şîretkarê nivîskar û zaniyarên ermenî li kurd Warekî karkirina Hecîyê Cindî, kedkirina wî û bi giştî mesrefkirina hêz îî hereket, zanînen wî îî bi hesabê dawî mesrefkirina zemanê ji boyî wî pir pêwîst îî giranbaha jî heye, ku em caraa ji bîr dikin, nagirin ber çavan. Lê heger em vî warî, vê faktorê jî bigirin ber hesêb - raezinayî, giranî û giringiya keda wî ya berhemdariyê ya zaniyariyê îî nivîskariyê wê bêtir zelal bê ber çavan û bi hêjatî bê nirxandinê wek kedêke ph mezin. Piştî vê yekê jî em bêtir metelmayî bimînin, kanê ewî çawa pê ra gîhand haqas zarbêja binvîse, lêkolînen zaniyariyê îî zargotinê ji ber zarê berhemên nivîsandina edebiyata bedew îî pirtîkên dersa bona dibistana bi cî bîne, ku dervayî hêza zaniyar îî nivîskarekiye, her çiqasî jî ew xudanê kemal û êmdîsiya mezin be. Ew war yê karkirina Hecîyê Cindiye wek alîkar ii şîretkarê nivîskar îî zaniyarên ei-meni ii kurd. Hecîyê Cindî ronakbîrekî herî naskirî, zaniyar û nivîskarekî kurdî herî bi nav îî deng bîi nava ronakbîrên ermeni û kurd da. Lê wana ne ku bi tene ew nas dikirin, bi ser da jî jimareke wan ya kifş dibû hewcê alîkarî û piştgirî, nemaze şîretên wî weke zaneke mezin ji bona bi cîanîna lêkolînen xwe, nivîsandina berhemên xwe. Ewana, weke dibêjin, bi zanînen wi ra hesab rîidiniştin û, ya here sereke, dibîin hewcê wan zanînan. Ewa ku Hecîyê Cindî bîi alîkar îî şîretkarê ronakbîrên kurd li Yêkîtiya Sovyêtiyê îî bi tayîbeti h Ermenîstanê hetanî warekî ne tişteke metelmayîne, paradokse, ber ku gorî qewil îî şertên, ku dora kurdên wî welati çê dibîin çanda wan ji nîi va, bê berdewamkirina çanda temaraiya gelê kurd h Kurdistanê ya kevna û nîi, rasttir, ji wê çandê qutbîiyî - hev 122 girt ii pêşva çîi

Îi Hecîyê Cindî jî bîi bingehdarekî wê çandê. Lê ku Hecîyê Cindî her usa jî bîi alîkar û şîretkarê nivîskar îi zaniyarên ermeni jî - eva yeka bi temamî tişteki metelmayîne, paradokse. Em zanin, ku ji nava ermeniya mezinayên cîhanî peyîda biin, yên weke Xaçatîir Abovyan, Arêtîk îsahakyan, Hovsêp Orbêlî, yên ku bilî çanda miletê xwe xizraeta çanda kurdî jî kirin îi bîin dost û xêrxazên gelê kurd yên helal îi amin. Raste, ji nava kurdan jî mezinayên, ku em weke yên cîhanî dikarin bi nav bikin, derketibiin, lê berhemên wan hela hê nebibiin mal îi milkê kurdên Ermenîstanê îi ronakbîrên wan bi sebebê, weke me got, qutbîina wan ji welatê bav îi kalan, ji çanda kurdî ya kevnar îi nîi. Dupayî ew zaniyar îi nivîskarên ermenî dibîin hewcê alîkarî ii şîretên Hecîyê Cindî, yên ku dîrok, çand îi jiyana gelê kurd, qehremanên wê jî dikirin babeta lêkolîn îi berhemên xwe. Ê ber ku wana Hecîyê Cindî weke zanekî wê dîrokê, çandê, erf îi edetên gelê wî yê kîir îi gelek baş didîtin, beriya weşandina lêkolîn, berhemên xwe ew didan ber destê wî, ku şaşîtî îi kêraasiyên di nava wan da kifş îi serrast bike, cama jî bibe rêkomênder, kefildarê çapkirina wan berheman. Lê pir caran jî wan zaniyar îi nemaze nivîskarên ermeni ew berhemên xwe didan ber destê wî ji bona serrastkirinê, yên ku eleqa wan bi çand ii jiyana gelê kurd ra qet nîbîi. Gelek caran ez biime şedê wê yekê, ku gava Hecîyê Cindî ji ser ciyê karê xwe yê fermî westiyayî vedigeriya malê boxçekî kaxezan ji binçenga xwe derdixist, dadanî ser masê ii digot: - Eva jî berhema hogirekî min yê ermeniye, daye min, ku ez wê serrast bikim îi nêrîna xwe ser wê bêjim. Bele, zemanê Hecîyê Cindî bi kar îi barê wî yê şexsî yê lêkolîneriyê, berhemdariyê va dagirtî bii her deqek, weke dibêjin, ji wîra zêrê zer bû, ber vê yekê jî ewî ev wesîfa li jorê kifşkirî bi dijwarî



dipejirand, lê bi pêra jî bi dilxweşî wek nişana naskirina zanebînên xwe ji yalê ronakbîrên erraenî da îî weke berpirsyariya himberî hogirên xwe yên erraenî yên xêrxwaz îî dilsoz da. Lê gelek caran jî, neraaze nivîskarên ermenî, yên ku berhemên angor çîik ser kurdan, dîrok îî çand, jiyana wan bi cî danîn bi xwe dihatin bal Hecîyê Cindî, ew berhem jêra dixwendin û rû bi rû guhdariya pêşniyar îî serrastkirinê wî dibîin. Ez bi xwe biime şedê bîiyereke bi vî awayî. Weke tê bîra min, havîneke sala 1954-a, yanê jî 1955-a bii, gava ez xwendekarê Zanîngeha Yêrêvanê bûm ii pişfî întiyamên nîv salê ra çîim mala Hecîyê Cindî. Neferên mala apê Hecî 123 tamam çîibîin gund, havîngehê, zozanan. Ew bi tenê mabîi. Eme rîiniştî û bi axaftin bîin, gava şayîrekî ermenî, yê ji ape Hecî ciwantir, lê îdî bi nav îî deng, xudanê talant, kemala mezin Gêvorg Êmîn hat. Weke kifş bîi, ewî beriya hatina xwe apê Hecî ser mexseda vê hatinê agahdar kiribîi, qayîliya wî bona vê rasthatinê stenbibîi. Pişti slav- kilavan, hal lî hewal pirsînê, Gêvorg Êrain ji nav boxçekî çend kaxwezên bi destnivîsar derxistin, danîn ser masê îî got: - Hecî can, weke min îdî tu bi sivikayî agahdar kirî, eva nivîseke mine, ku min ew nîi pêk aniye ji bona weşandina kovarêda. Min ew ser gundekî Ermenîstanê yên kurdên êzdî, riinîştevanên wê, ser kar îî barê wan, ser pêşketina wî gundî di warê perwerdê, çandê îî jiyana xweş da nivîsandiye {mixabin, nayê bîra min ew kîjan gund bû-W.E.). Û ber ku ez cara yekemîn rii bi rîi rastî gundiyan kurd hatim, cara yekemîn min nasiya xwe da jiyân, erf îî edet, deb îî rizra, felsefa mantalîta wan- îhfîmale, ku şaşîfî u kêmasî, tecriibên min yên ne tamam rast nivîsê da çê bîibin. Ezê niha ewê nivîsê ji te ra bixîinim îî rica dikim tu jî weke mirovekî eslê xwe da kiud u neraaze ronakbîrekî kurd guhdariya min bikî, ku

dawiyê da nêrîna xwe ser wê nivîsê ji min ra bêjî, şaşîti ii kêmasiyên wê kifş bikî. Ez pir qedrê qelem îi zanînên te digrim. Destpêkê da baxişandinê ji te dixwazim, ku zemanê ji boyî te heqasî pêwîst distînim ii bi ser da ji spasiya xwe ya mezin îlanî te dikim. ... Û Gêvorg Êmîn nivîsa xwe xwend. Ji wê rojê 50 sal, niv sedsalî buhuriye îi ber wê yekê jî naveroka wê rind, zelal nayê bîra min. Her tê bîra min, ku ewî di wê da besa hatina pezê nivro, mîyên dotinê ii denkirinê jî dikir. Lê nivîs gelekî bi germayî, bi hizkirina ber bi gundiyên kurd hatibî nivîsandinê îi ji min ra pir balkêş, hewaskar bîi, ber ku ew bi pêniisa şayîrekî xîdanê kemala raezin hatibî nivîsandinê, her çiqasî jî ew wî zeraanî çivan bii, lê ji min mezintir bîi. Reng û riyê Gêvorg Êmîn raejîyê rain da weke wênekê dexme bîye, ew vê gavê jî zelal li ber çevên mine. Pişt ra, gava Gêvorg Êmîn gihîşt temenê mezin, riidana xwe hişt, lê wî zemanî sîretê xwe kur kiribîi, siraêlê xwe yên hela hê reş kurtisandibîin, ku gelekî li reng îi rîiyê wî, li çevên wî yên reş dihat; ji çevên wî, yên ku dibiriqîn ii diçîirisîn, aqil û kemal dibarî. Ew yek jî rind tê bira min, ku hetenî tamamkirina nivîsandma xwe, bi pêra jî axaftina bi Hecîyê Cindî ra ii guhdarkkîna serrastkirinên wî, nêrînên wî yên ser nivîsê - Gêvorg Emin pakêteke tamam sîgarên "Avrora" kişand, dîiyê wan hecamî 124 nava pişikên xwe kir. Apê Hecî ne cixarekêş bîi, lê ji dîiyê cixarên wî aciz nedibîi, ber ku havîn bû, derî îi pencerên oda wî vekirî bîin îi dilyê cixaran dest xwe da ji odê dikişiya, derdiket. Gava Gêvorg Êmîn dawî li xwendinê anî, apê Hecî hêja girantir ser naveroka nivîsa wî axivî, nêrînên xwe ser wê gotin îi beriya hemîîşkî ew ji bona bi cîanîna wê nivîsê dilxweş kir, sipasiya xwe weke kurd îlanî wî kir bona haqasi bi dil, xêrxwazî îi bi şewat bi cîanîna wê nivîsa ser kurdan. Belê, Hecîyê Cindi xwe

weke berpirsyarekî gelê xwe didît îî weke ronakbîrekî miletparêz  
 ewî ew ronakbîrên biyanî kêfxweş ii ruhdar dikirin, yên ku ser gelê  
 wî berhemên hêja dinivîsandin. Eva ji kîiltiira wî ya bilind, ji maqîlî  
 îî ciwamêriya wî dihat îî ji wê daxwaza wî, ku biyanîyên weke  
 Gêvorg Êmîn bêtir bike dost îî xerwazên gelê xwe û ser wê oxira  
 qenc wana vir hada jî bidefîne, verê bike. Piştra apê Hecî çend  
 nêrînên xwe ser nivîsa şayîrê ermenî gotin, lê evê te jî hemî gotin,  
 serrast kirin îî şîretên wî tomar, qeyîd dikirin. Gêvorg Êmîn bi  
 kêfxweşî îî spasdarike mezin xatirê xwe ji Hecîyê Cindî îî qewimê  
 wî yên ciwan - ji min xwest û çîi. Nivîskar îî zaniyarên ermenî yên  
 here bi nav îî deng keda Hecîyê Cindî di warê pêşvabirina ebediyet  
 îî çanda kurdî ii bi tayîbetî berevkirin ii lêkolîna zargotina kurdî da,  
 her îisa jî qewînkirina girêdan îî pêwendiyên navbera gelên kurd îî  
 ermeni, dostaniya navbera wan da bi hêjatî îî bilind dane  
 nirxandinê. Bese em bejin, ku şayîr îî nivîskarên ermeniya yên usa  
 mezin derheqa Hecîyê Cindî da bi kêfxweşî îî ./ , ^J" pesinandin  
 nivîsîne, keda wî ya mezin di , |vY / warê çanda Kurdî da bi hêjatî  
 dane \* '\* '■^■'y/// / ^ ■^^û// "'\* <)' / C ^' "" '<1\\*^' >Vx' /'^>î )  
 y 'V'/V"" "Y^V ' ç.~ kifşkirinê, çawa Avêtîk îsahakyan, Dêrênîk  
 Dêmîrçyan, Hovhannês Şiraz, Hiraçiy a Koçar îî y ên dînê.  
 Hovannês Şiraz, ku hetanî warekî jî ^^^""Tf^""^" 0' nijadperestekî  
 hişk bû, Hecîyê Cindî himberî meznayîkî ermeniya yê herî mezin,  
 .ronayîdarê ermeniyayî mezin, bingehdarê edebyeta ermeniya ya  
 nîi, dost îî xêrxwazê gelê kurd Xaçatûr Abovyan dike. , ,.i mvisara  
 H. Şiraz Ê ber ku Xaçatîr Abovyan weke pîrozîke gelê ermeni tê  
 dîtmê, ev berhevdanîn xweberî xwe şedetiya gele tiştî dide. 125  
 Hecîyê Cindî nemaze îî bêtir alîkar ii şîretkarê nivîskarên kurd bîi.  
 Weke serokê seksiyona nivîskarên kurdan ya Yekîtiya nivîskarên

Ermenîstanê yê pir salan bi dehan îî belkî bi sedan jî bêtir pirtîikên nivîskarên kurd bin destê wî ra derbaz bîine, ewana rênarae, destîimama weşandina wan ji wî sitendine. Edetekî wa çê bibil: beriya çapkirina pirtîikên nivîskarên kurd civîna seksiyonê da ew dihatin lênihêrandinê, weke bal me digotin, enenekirinê îî gava begemiya piraniya endemên sêksiyonê û beşdarên civînê bi dengdan distendin, hêja ew ji bona weşandinê bi rê dikirin weşangehê, lê pişt ra jî çapxanê. Hecîyê Cindî her çiqasî jî mirovekî rehm îî dilsoz bîi, lê ewî nêrîna xwe, fikir îî tecrûba xwe bi objêktîvî ser her berhemekê, pirtîikekê dîhar dikir. Ez bi xwe jî beşdarî wan civînan dibîim ii rind tê bîra min, ku ewî guhdariya xwe dida ser her dêtayeke berhemê ya biçîik jî. Ewî berhem temara dixwend îî hêja nêrin û serrastkirinê xwe eşkere dikirin. Ew yek jî tê bîra min, ku gava me berhema nivîskarekî me yê naskirî enene dikir dawiyê Hecîyê Cindî jî xudanê wê ra got: - Kurteromana te başe, lê te bi lez îî bez ew nivîsiye, ber wê yeke jî ew weke hevîrekî nehilatiye. Baş dibe, ku tu bi sebir careke dinê li nivîsandina wê vegeerî. De îcar herin îî hesaba ji xwe ra bikin: xwendina sedî bêtir pirtîikan îî amadekirina nêrîna xwe ser wan ii bi pê ra jî organîzekirin îî bi cîanîna civînan wê zemanekî çiqas dirêj bistîne. Kar û barê Hecîyê Cindî di vî warî da jî rae bêtir raetelmayî dihêle, gelo ewî bi çî awayî pê ra gîhand kedêke haqas mezin di warê nivîsandin ii weşandina berhemên xwe da jî bi cî bine. Lê wî çiqas zanîn, hêz û hereket mesref kirine wek serokê beşa kurdzaniyê ya însfîtiita Rojhilatziyê ya Akaderaiya Ermenîstanê ya zaniyariyê. Li vir jî bi sedan gotar îî monogirafîyayên zaniyariyê bin destê wî ra derbaz bûne. Keda Hecîyê Cindî kifşe her ûsa jî di warê amadekirin, gîhandina kurdzanên nîi, yê ciwan da. şagirtên

Hecîyê Cindî ne pir bûn, Raste, aspîrant, lê amadekirina kurdzanekî weke Çerkezê Reş hêjayî amadekirina gelek kurdzanan bîi. Têza bereradatiya doktorê zaninên filolojî ya Çerkezê Reş ser zargotina kurdan bîi ii bi karanîna wê bii ji aliyê nivîskarên ermenî da. Ber vê yekê jî Hecîyê Cindî hilbijartin wek serokê wî yê zaniyariyê. Çerkezê Reş yê şagirtê Hecîyê Cindî bi serkeftineke mezin ev têza xwe civîna zaniyarên ermeni 126 da parast yên ku bi yekdengî ew tez pejirandin û navê berendamê zanînan filolojî danîn ser Çerkezê Reş. Hilbest, di vî warî da rola serekîn talant, kemala Çerkezê Reş ya xwezayî ya mezin berpirsyar, minetdarê Hecîyê Cindî didît. Iyîst. Hetanî mirina xwe ya ji zeman zûtir jî Çerkezê Reş bi şêkirandineke mezin xwe weke Mamoyê Xalit aspîrantê kurdzanê bi nav îî deng Emînê Evdal bû. Piştî mirina Emînê Evdal Hecîyê Cindî bii şîretkar îî alîkarê wî di warê amadekrina têza wî ya berendamê zanînan da, ku ser êtnogirafiya kurdan hatibîi bi cîanîne. Lê heger em bi giştî li kar îî barê Hecîyê Cindî mêze bikin di warê araadekerina kurdzanan da emê bibînin, ku ew mamosta û şîretkarê wan hemîi kurdzanên kurd bîi, yên ku li Ermenîstanê zemanê jiyân û karkirina wî da ghiştin, bejin kişandin. Hecîyê Cindî wek oratorekî (peyîvkirekî) naskirî di nava kurdan û ermeniyân da Ez hetanî zemanekî çend cara bibûm guhdarê Hecîyê Cindî yê weke orator, axaftinker di civîn îî şevên kurdan yên cejnî da îî min tehsha peyîva wî ya oratoriyê ya mezin ne ku li ser xwe, lê li ser hemîi beşdarên wan civîn û şevan tecrîbe kiribii. Lê min oratoriya wî ya bi zimanê ermenkî nebihîstibîi, nedîtibîi. Ew roj jî hat. Sala 1969-a 60 saliya biîyîna nivîskarê enneniya yê mezin Hiraçiya Koçar tamam bû, lê sed mixabin, îdî çend sala piştî wefat kirina wî ya ji zeman zîitir. Şeva ji bona

kifşkirina 60- saliya Hiraçiya Koçar Ermenîstanê da bi govekeke berfureh, ser nîvoya pir bilind hate organîzekirinê: bi desti hukumeta Ermenîstanê, rêvebiriya Partiya Komûnîstan îî Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê: bi beşdarbîna serok- berpirsyarên hukümetê ii partiyayê, ser nivoya ofîsiyêliyê ya bilind. Ber vê yeke jî lîsta axaftinkerên şevê da pir sinor kiri bû: her kes nikaribî vê şevê da biaxivîya, her çiqasî jî ew nivîskai- îî zaniyarekî bi nav û deng bîiya. Lê em ronakbîrên kurd pê hisîyan, ku hukuraetê û Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê navê Hecîyê Cindî jî xistine nava hsta axaftinkera. Ev îzbat bi xwe îdî serbilindîke mezin bû ji bona me kurdan. Ez bawerim, ku Hecîyê Cindî hereket mesref kiribî ji bona navê xwe bixe nava wê lîstê îî ne kîî tu bêjî ji ber wê yekê, ku bi vê axaftinê quretiyê bike u nav îî dengê bilindthr qazanç bike. Qet jî na. Hecîyê Cm<sup>^</sup> ne ji mirovên îisa bîi. Sebebê bi cîanîna vê yeke ye bingehîn di nava wê 127 yekê da bû, ku Hecîyê Cindî dixwest berpirsiyariya xwe îî gelê xwe bi cî bîne himberî bîranîna dost îî xêrxwazekî gelê xwe îî çanda wî, bi pêra ji hogirê xwe yê nêzîk Hiraçiya Koçar da. Li vê tamgê era pêwîst dibînin keda Hu- açiya Koçar di warê peşvabirina edebiyet îî çanda kurdî da h Eraienîstanê bi kurtebirî kifş bikin. Ew esilê xwe da ji yalê Eleşgirê bû, zarotiya wî nava ermeniya û kiu-dan da derbaz bibî, ber vê yekê jî kurdî zanibî. Bavê wî- Koço qedh îî siyaneteke bihnd nava kurdên wê nawçê da bi dest anî bû. Gava sala 1930-î li Yêrêvanê dest bi weşandina rojnama kurdî ya Rya Teze bîi, wek zanê zunanê kurdî Hiraçiya Koçar kifş kirin weke berpirsyai-ê wê yê yekemîn, lê berpirsyarê eslê xwe da kurd yê wê rojnamê yê yekemîn pişti Koçar û Harîityîin Mikirtçyan Cerdoyê Genco bîi. Gava destpêka salên 60-î li Kurdistana Başîir dest bi serhildana kurda bi

seroketiya Barzaniyê Nemir bîi bi izindana çû wira hukumetê îi li pala Hiraçiya Koçar çiyayên hat, bilind rasfî Lê serokê gava kurdan ji wir pêra axivî. vegeriya, civîna ronakbîrên kurd da li sera karkirên hunerê da derheqa wê yekê da axivî îi bi tayîbetî got: " Ez odeke bi goveka teng da li serê çiya rastî Hecîyê Cindî li kongreya nivîskarên Ermenîstanêye 3-ada (s.1954). Barzani hatim. Ewî ez dame runiştinê, lê bi xwe jî dema axaftina bi min ra ji serîkî odê diçî serê dinê. Min wê demê Barzani şiband şêrekî, Ji çepê: yê duda - Hiraçya Koçar, Hecîyê Cindî, Avêtîk Isahak)'an. ku xistine nava qefesekî teng". Ev gotina Koçar qet ji bîra min naçe. Hkaçiya Koçarê nivîskar berhemên xwe da pêsonaj, qehremanên kurd bi awakî heri baş îi xweş raxistine ber çavan: weke dost îi xêrxazên en-neniya, weke mêrên mêrxas, dilsoz, ciwamêr. Di gotareke yên xwe da Hhaçiya Koçar dijî wan kurdî kesan wek bi tundî radiweste, ku qestbende, mexsîis zimanê zimanekî xizan, netemara dibînin u kifş dike, ku zimanê kurdî zimanekî şayîrî, dewlemend û pir xweşe îi caraa wergerandina hinek cumle, hevokên bi wî ziraanî ne mîirakîine bi teraamiya naveroka wan wergerînî ser zimanekî biyanî. Ew mîsaleke wa ji peyîva kurdî tine navê: Êvare xweş êvare, dilê min zare zare. 128 Pişti vê mîsalê ew dinivîse: " De îcar were vê gotina xweş îi bi fikra kîir wergerîne ser zimanekî dinê". Bilî Hecîyê Cindî Hiraçiya Koçar hogu-tîke xweş bi çend ronakbîrên kurd ra dikir bi tayîbeti bi nivîskar îi zaniyarên bi nav îi deng yên weke Emînê Evdal îi Nadoyê Xudo Maxmîidov. Awa sebebê hewildana Hecîyê Cindî yê bingehîn ji bona bi cîanîna berpirsiyariya xwe ii gelê xwe himberî dosteki weke Hiraçiya Koçar da. Şev di 28-ê gulana sala 1969-a da sera Têatira ser navê Sûndîîkyan da ya dewletê ya akadêmisiyênîyê da çê bîi. Sedirtiyê

da, U ber textê pêşberî serayê serok- berpirsyarên dewletê ii Yekîtiya nivîskaran rîniştibîin û di nava wan da Hecîyê Cindî. Sera bi xwe jî bi ronakbîrên ermenî, kurd u milletên dinê va, bi gelek runiştewanên bajêr îi komarê va kimkimî bîi. Pişti axaftina şayîr Hiraçiya Hovhannîsyan ya vekirina şevê, pişti rapora edebyetzan Soxomon Soxoraonyan ya ser jiyana ii kar îi barê Koçar, pişti axaftina du- sê kesên dmê, destiira axaftinê dan Hecîyê Cindî. Me ronakbîrên kurd yên li wira araade- Casimê Celîl, Nadoyê Xudo, Şekroyê Mihoyî xwe, weke dibêjin, bîna xwe di qefesa xwe da girt, ber ku me weke kurd xwe berpirsiyarê Hecîyê Cindî didît civîneke wa bilind îi bi pirêstîj da. Karê xîret û namiisê bîi: gelo Hecîyê Cindî wê bikaribe xwe bi pê ra jî me û gelê me vê şeva giran da riispî bike? Tiştêkî henek û laqkdî nîbû: Hecîyê Cindî gofî li ber Serokên Ei-menîstanê, li ber kulîlkên ronakbîrê ermeniya bi zimanê wan yê zikmakî bipêyîviya. , . Gava Hecîyê Cindî dawî li axaftina xwe anî êmekî kerî ii lalî di serayê da çê bû. Ê ji nişkê va hemûşka bi hev ra çepikên xwe ji wî ra li hev xistin: bi zemanekî dirêj. Ji wê dengê çepiklêxistina teyê hew tirê eveke, banê serayê wê ji cî rabe, ezmanan keve. Me, ronakbîrên kurd alîkî da hetanî him- zora me têrê dikh- çepik hev dixistm- yalê din da, weke dibêjm, me bin çavan ra li hev raêze dikir, li çevên hev dinihêrî û bi vê yekê şabûn û serbilindiya xwe ji bona vê serkeftina kalê çanda kurdî- Hecîyê Cindî li hev pare vedikk. Ev axaftma Hecîyê Cmdî ya balkêş û zimanekî ennenî yê sîipêr û xweş nava biyandan da serbilindiya me û gelê me bû. Bili bi hêjati nhxandina keda Hiraçiya Koçai- di warê pêşvabii-ina çanda kurdî da Hecîyê Cindî bi vê kêlraa xwe bê şalûzî, bi awakî ciddî û bi zaniyarî makkirî keda ronakbîrên ermeniya yên dinê jî û bi gişti ya gelê ennem di warê çanda kurdî



da bi hêjati şêkh-and. Bi vê yekê ewî kêfa hemû amadên şevê yê emienî xweş kh îî bi awakî êndîrêkt ewana amade kkin ji bona pişgiriya 129 vir hada jî himberî karê pêşvabirina edebiyet û çanda kurdî li Ermenîstanê. Hecîyê Cindî bi vî awayî jî piştgir îî xêrxwaz ji bona gelê xwe û çanda wî peyîda dikirin. Belê, bi şêkirandina keda ermeniya. Lê eva yeka jî tiştêkî pir pêwîste. Ne axir hetanî dê îî bavên helal jî, gava dibînin law îî keçên wan emek, keda wan weke pêwîste naşêkirînin, ji wana hetanî warekî sar dibin îî eksî vê yekê, gava şêkirandina wan dihesin bêtir ser wan dişewitin, dikalîn, bêtir emek li wan dixin. Gava Hecîyê Cindî dawî li axaftina xwe anî îî ji ber mîkrofonê dîir ket îî hat şuna xwe ya berê da rîinî, we bidîta bi çî awayî giregirên sedirtiyê da runiştî ew hemêz dikirin îî kefxweşî îî spasiya .wve bona axaftina wî îlan dikirin. Lê gava dawî li şevê hat îî Hecîyê Cindî dema derketina ji serayê era ronakbîrên hogkên xwe ji dûrva dîtin, xwe li me girt û hat, vê carê me ew ji boyî serkeftinê pîroz kir. Hecîyê Cindî yekî usa bîî; era di nava xelkê, biyanan da rîispî ii serbilind dikirin. Hecîyê Cmdî ruspîtiya me bû, hê jî rîiyê me sipî dike û wê duyerojê da jî sipî bike. A ji ber van hemû hest û hisan bîî, ku gava ez ji wê şevê vegeyîyam hatim malê rain li ser vexwendinnaraê bi pêniîsa hubra sor nivîsî: "Ez çume şevê. Min wergera xwe ya piyêsa ser bingeha kurteroraana Koçar ya "Hisret" ji bona radiyokompozîsiya bi kurdî çêkirî da destê keça Koçar- Mêriyê. Şevê da Hecîyê Cindî axivî. Ez ji şevê bi dilekî şa vegeyîyam. Êvareke baharê ya hênîk û xweş bîî". Hecîyê Cindî beşekî zanînên xwe ji aqilbendîya gelê xwe hilda Kan, çavkanîke zanînên Hecîyê Cindî aqilbendî, felsefa gelê wî yê kurd bîî, ku xwe bi şewekî zelal nava zargotina wî gelî da dîhar dike. Ê Hecîyê Cindî ne ku tenê nîmîinên zargotina gelê xwe

ji ber zarê zargotan girtin, derbazî ser rîpelên kaxezan kirin î ew ji undabîinê .xilas kirin, lê her usa jî ew nava hiş î sewdayê xwe da tomar kirin. Eva yeka dema her axaftineke wî kifş dibî. Ewî ser her bîyereke jiyane çend mesele û metelokên kurdî bîr danîn, digotin. Hemîn romana wî ya "Hewarî" bi felsefe, bi mesele î gotinên gelerî çiqas bêjî dagirtiye. . . Hecîyê Cindî zor ii zuUra, telayî ne ku bi tenê ji destê dewletê, istîxbarata wê- KGB dîtibî, ku ew bi zemanê salekê avît hebixanê, lê her usa jî ji destê mirovên dora xwe, heval î hevkarên ii bi tayîbeti yê kurd, ku xwe ronakbîr diheşibandin. Evi^ ronakbîrên, kii emi.besa wan 130 dikin, ji ber karaktêrê xwe yê raenfeetçîtiya şexsî, kariyêrîstiyê hewl didan yê weke Hecîyê Cindî esil ronakbîr ii esil zane ji holê rakin ii ciyê wî bistînin, hewil didan, ku wî ji navê bidin rakirinê î dilê xwe bi wê yekê rehet kin. Pişfî mirina Stalîn jî, pişfî wê yekê gava h sovyetistanê hinek azadî î dêmokirasiya çê bî, van "ronakbîran" bi sîçkirina Hecîyê Cindî her berdewam dikirin: bi ghanî civînên nivîskar- ronakbîranda. A derheqa sîçkirina xwe civîneke ronakbîrên kurda da Hecîyê Cindî rojekê ji min ra got, gava gotin hat ser sebir kirin, bîn firehî û cesaretê mêra. - Wezîrê min, - ewî got,- min pir eziyet, êş î jan kişandiye ji destê hinek heval î hogirên dora xwe. Berê ez ji rexnekirin ii bi siçkirinê wan pir aciz û bîn teng dibiim, lê niha wana sivikth dibuhurînim. Ê sebebê wê sebirkirin î bînfirehiya min ya niha apekî minî nexwendî, lê aqilbend î dîne dîtî Bekîrê Şemo bî. Rojekê civîna me ronakbîran ya bi sirê da çend lawikên kurdan li min hatin hev, ez nava kirinên nebiiyî da rexne î bi sîc kirhn. Ez bi dilêkî şikestî, bi xemgînîke kîr vegeyam malê. Gava mm derî vekir- bala xwe dayê apê minî Bekir ji gund hatiye î benda mine. Ez hinekî kêfxweş bîim, em çîin

dest îî rîiyê hev, hal ii kêfê hev pirsî. Lê apê Bekirî xweyê tecrîba mezin îî dîirdîtî ji rain ra got: - Hecîyê rain, her çiqasî jî tîi hewil didî kêf îî beşera xwe bi min ra xweş bikî, lê weke ez dibînim, tîi îro gelekî xemgînî. Tê apê xwe ra bêjî, ka sebebê vê yekê çiyê? -Apo,- min bersîva wî da, - ez çî ji te îî çî ji Xwedê veşêrim. îro civîn- civata rae ronakbîrên kurraanca bîi. Hine ronakbîr ez di nava tiştên usa da bi sîic kirim, ku haya min ji wan nîne, gur îî gumanê min nagîhîje wan. Piştî ve gotina xwe ez li bendê bîim, ku ewê, weke dibêjin, di halê min da bigrî, heyfa xwe li min bînê ii bi pê ra jî bona min- biraziyê xwe, pir xeragîn bibe. Lê şîina wê yekê ew ji nişkêva keniya. Ez ya xwe bêjim; ji vî kenê wî ez di nava xwe da pir acizbûm, lê min ew yek ji ber rêz u hurmeta himberî teraenê apê xwe yê mezin da eyan nekir. Zîitirekê ne ku bi tene ew acizbîina min, lê bi tamamî xemgîniya rain ji min revîn, gava wî piştî kenê xwe ji min ra got: -Ê! Hecîyê min, wa nebîi... Tu ji ber gotinên nezan, xêmxwaz ii dijminan xeragîn dibî?.. Ne axir tê bi wê yekê bişkêyî ii dilê wan bi xwe şa bikî. - Lê ez çî bikira?- min ji wî pirsî?

131 - Hecîyê min,- ewî bi awakî hêsan, rehet bersiva min da,- eyarê mêra gofî fireh be, her tişt tê da bi cî bibe. Ev gotina apê min weke bizraarekî di serê rain da riinişt, îî piştî wê şîretê, gava hinek rairov rain rexne îî bi sîic dîin, ez evê gotinê bîr tînim îî îdî weke berê xemgîn nabim. A Hecîyê Cindî yekî wa bîi. Her çiqasî jî ew talantekî xwezayî ii zaniyarekî kîir bîi, lê gotin îî şîretên aqilbenda jî xwe ra dikirin weke guhar îî guhên xwe va dikirin. Hecîyê Cindî piştî mirina hogirên xwe yê pênûsê xwedî 11 mirata wan ya berhemdariyê derdiket, ew dida weşandinê Dema min destnivîsara Bîranînên Firîda Hecî dixwend, Firîdê bi xwe bi awakî êndîrêkt bala rain kişand ser araadekirina vê nivîs- bîranîna rain.

Û, awa, bi çî celebî. Ewê di vê pirtîika xwe da bîr anî bîî, ku bavê wê- Hecîyê Cindî, piştî rairina welatî, gundî û hogirê xwe yê ji deraa zarotiyê Emînê Evdal (herdu jî rûniştvanê gundekî nawça herêma Qersê ya Dîgorê- gundê Emençayîrê bîin), ku kurdzanekî bi nav îî deng bîî, îî dû bi çî awayî wî li mîrata wî ya berheradariyê weşandinê. Evê gotina xwedî Firîdê derketiye pirtîikên dane raîsaleke derbarê vê yekê da ya konkirêt îî balkêş xiste bîra min ii min biryar danî vê nivîsbîranîna xwe ser yên heyî da zêde bikim, ber ku ew bi awakî dîrêkt bi şexsê min ra jî girêdaye. Piştî mirina Emînê Evdal di sala 1964-a pirtîikekî wî ya ser êtnografiya gelê kurd îdî çapxaneke Yêrêvanê da li ber weşandinê bû. Sed heyf, Eraînê Evdal pê ra negîhand vê pirtîika xwe ya giranbiha ya bi kurdî nivîsandî- weşandî bibîne ya bi vî sernavî: "Heleqetiyêd pizmamtiyê nav kurdada". Rojekê zengilê (zîlê) têlêfona mala min lê ket. Gava rain rahişt tetka wê, dengê Flecîyê Cindî yê weke mexmer nerra ii xweş li min tesele bîî: - Wezîrê min, - ewî têlê da got,- zanî ez ji bona çî te aciz dikim, tera têlê dixim? - Na, apo, nizamim, lê axaftina te bi min ra ne kê acizkirine, lê serbilindiye. - De îcar bibihê, ez tera çî dibêjira, - apê Hecî gotina xwe berdewam kir û rain di nava awazê axaftina wî da notên xeragîniyê, netabetiyê îî bêsebiriyê tecriibe kirin, - pirtîika Emînê Evdal,- ewî gotina xwe berdewam kir, - di çapxananê dane ji bona weşandinê. Weşandina wê heraa heraa pêra gihiştiye, lê baş bii, ku rain biryar danî 132 careke dinê jî rûpelên wê yên bona çapkirina dawî kontrol bikira, her çiqasî jî eva yeka ne wezîfe, ne berpirsyariya min bîî, lê ya hinekên dinê bîî. Xulase, min riipelên çapkirî, yên bona çêkirina pirtîikê amade hildan, birin malê, ku bixînim, kanê ji nişkê va şaşitî tê da derbaz nebîine îî heger hinek şaşitiyên tîpan tê

da çêbîine- wana serrast bikim. Axir apê teyî Emîn ne zêndiye, ku weke avtor kontroliyê li çapbîina pirtîika xwe bike îî şaşîtiyên dawî serrast bike. Em gotî şîina wî berpirsyariya bê şaşî weşandina pirtîika wî hilgirin ser milên xwe. Lê gava min ew rûpel birin raalê, xwendin: ecêbeke reşe giran; semavên hinek pirtîik îî çavkaniyan, neraaze yên bi zimanên biyanî ii bi tayîbetî- alraanî, ku rehraetî ji bona nivîsandina vê lêkolîna xwe bi kar anîne, bawer bikî, heraîşk jî bi şaşîtiyên raezin va hatine çapkirinê. Serrastkirina wan ne karekî hêsane, her bi tenê ew ronakbîr, ew kurdzan dikare wan serrastkirina bi cî bîne, yê kii semavên wan pirtîik îî çavkaniyan rind zane. Lê tu jî kurdzanî, te dibistana kurdzaniyê navendeke weke Lenîngiradê da (niha: S. Pêtêrbîirg) tamam kiriye îî kesekî dinê, ku ji te baştir van serrastkirinan bi cî bîne vê gavê li ber çevê min nakeve. Were rîipelên pirtîika rehmetiyê apê xweyî Emîn ji bal min hilde, bibe, serrast bike, bi wî qewlî, ku tu şaşîtî tê da nemînin, ber ku eva yeka navê yekî weke Emîn ra girêdaye. Ew şaşîfî jî ne bi sîicê Emîn çê bîine: rehmetî semav rast nivîsandine, ber ku almanî rind zanibîi, lê piştrra yên ku têkst daktîlo kirine îî çapxanê da jî herf rêz kirine ji ber nezaniya zimanê biyanî şaşîtiyên raezin nav ra berdane. Tu vî karê mîihîm weke rêdaktorê vê pirtîikê yê resmî, ofîsiyal jî dikarî bi cî bînî. Ezê Akademiyayê ra bipeyîvim, ku navê te li ser pirtîika Emînê Evdal xin wek rêdaktorê weşangehê. - Apo, - rain jê ra got, - ez kengê dikarim bêm wan riipelan ji bal te hildim îî bême kî derê? Ev pirsyara rain bi xwe êdî nîşana pejirandina pêşniyara Hecîyê Cindîbû. -Dikarî heraa îro êvarê jî bêyî û wana ji raala rae hildî- bibî,- apê Hecî bersîva pirsyara rain da. Min heraa usa jî kir: hemî şaşîfî serrast kirin îî gava riipelên sen-astkirî dan destê apê Hecî, ewî jî gorî karaktêrê xwe li sen-astkirinên min

raêzekir, hêja xeragîniya wî buhûrî, kêfa wî xweş bîi îi ewî ji min ra got: - Şîrê Karê li te helal be, te apê xweyî rehmeî Eminê Evdal jî û ez û xwe jî bi pê ra riispî kirin. 133 Sala 1965 weşangeha Akaderaiya Ermenîstanê ya zanyariyê pirtîika Emînê Evdal gîhand ber destê xwendevanan. Hecîyê Cindî ji bîr nekir sozê ku dabîi min, bi cî bîne: navê min li ser pirtîikê wek rêdaktorê waşandinê qeyîd kiribîi. A bi vî awayî, Hecîyê Cindî himberî hogirên xwe rairovekî helal, arain û xwediyê bextê raêrê çê bîi. MIRAZE UZO CEFAROV (1947- 2008) PIRTÛK DERHEQA KURDZANÊ MEZFÎNDA "Sala 1989-a bû. Bavê min-Hecîyê Cindî nexweş bû. Hîmlîji dilê xwe digazinî. Me emirê xweda carapêşin bavê xwe bê kar didît. Ewfi pirr ber xwe diket, ku naxebite, nanivîse, naxûne. Digot: kaltîyê zor min kiriye - bêhewas bûme... " "Mixabin, Em carina diçûn - ber bîna wîda dihatin. Ewî hey zarotiya xwe, rojêd buhurîye reş, rojên emirê xweye baş û çetin danî bîr... Ê min dinvîsî... û piştra pirtûkek amade kir bi bîranîna, şirovekirina, îzbatiyêd arşîva, qîmetkirina, nêrîna ûfotoyava. Xwedana wan xetan Firîda Hecî Cewarîye. Lê semavê pirtîikêye "Hecîyê Cindî: jîyan îi kar". Ew dîyariye bo sersala caraêrekî bi heq efsaneye raamosta, -zaniyarê doktorê kurdî navdar, ulmên fîlolog - folklorzane, karraendê nivîskar, ulmêyî fîlolojiyê, pirofêsor, emekdar yê Ermenîstanê - Hecîyê Cindî Cewarî. 10 - 15 sal berê minê binvîsiya ku ne hevceye vî navî derxin bidine ber çevê xwendevana, meniya wê yekê ku kurd hemîi jî wî nas dikin û ew ne ku tenê kurdan ra nas bîi. Lê, di van sala da gelek tişt hatine guhastinê: silsileta teze gihîşt, kîjan jî, dibekî, qet navê vî raerivî xizraetkarî raezin nebihîstiye, yê ku bona qenciya çand ii zaniyariya tiraaraiya kurdan zehmet dikişand. Silsileta teze haj xebata wiye nebînayî di dereca top kirina folklor

kurdaye ciraetiyê da nîne, tertîb kirina wêye ulraî îî neşu- kmna wan ser ziraanê cîire - cîire di Yekîtiya Sovêtêye berê da û sînorê wê der. Ez bawar nakira, wekî xwendevanê cahal bi berheraên wiye edabiyatîyê ra nasin (helbest, şiyêr, serhafî, hikiyat, piyês) û, tayîbetî, bi roraana wiye herîxweştir 134 "Hewarî", kîjan jî hê di saxtiya wî da hatibîî neşir kirm ser zimanêd kurdî, rûsî, eraienî li Yêrêvanê û Moskvayê. Du sal berê romana "Hewarî" di Almaniyê da hate çap kirinê, lê çendekî pêjda ser zimanê erebî hate vergerandin ii weşandinê. Roraan pêşkêşî erair, jiyîn, erf - edetên kurdên - êzdî ji êla Sîpkan ser erdê kal - bavan di Kudistana Turkiyê da, qewraandinêd dîrokî yêd destpêka sedsala XX, neçarî koçkirina pêşiyêd me di herêma Qavkaza Başûr da ne. Roman, tê bêjî, bi bênekî, bi gaziya dil û can hatiye nivîsê. Ew usa jî bi carekê va hilkişandina bên tê xwendinê. Di esarên dmiyalîkêye edabiyatîyê da nimiine kê mînin, gava navê nivîskarekî di dîroka edabiyatîyê da çava kilasîk dimîne tenê bi xathê berhemeke wî va. "Hewarî" nimîineke gorî wê yekêye. Di pktîika xwe da Fkîda Cewarî niisxa bîblîyografiya esarên Heciyê Cindî dide ber çevan. Wekî zef jî dil bikî, nikarî di miqaleke rojnamê da nave hemiya bidî, eva yeka wê çend sitiinêd rojnamê bigire. Emê tenê navêd çend esarêd wî bidin: "Sitranê cimeta kurda"(s.1936), "FoUdora kurmancî"(s.1936), "Hikyatên cûtieta kurda" bi şeş cildan(s.1961-1988, 2005), "Derheqa edabiyata kurdaye Sovêtîyê di Ennenîstanê da"(s. 1970), "Variyantê dastana kiu:dî "Rostemê Zal"(s.1977), "Çîrokê kurdaye cimetiye"(bi zimanê rîisî, s. 1985), "Nesîhetê cimeta kurda"(s. 1985) îî gelek yê n raayîn. Ezê usa jî serda zêde kim pirtîkêd dersên zimanê kurdî yêd ku gele caran dahatine teze da çap kirinê, ji sala 1932 dest pêkirî, ii, bawarim, hê wê bêne serî da çap kirinê. Haya

miii jê heye, ku di salêd jîyîna xweyê axriyê da ewî bi êginî "Elîfba" teze hazir kir, kîjan jî îro zarokêd kurdan ra ha ferz lazime. Eva, bi heqîqetî, pirtîîkxaneke tame. Lê wekî serda hê bê zêde kirin ew destnivîsêd wî yêd ku di arjîva wî da têne xweyî kirin: Cilda dudan ya "Nesîhetê cimaeta kurda", "Variyantê dastana "Dimdun", "Şirovekirina uhnî derheqa "Ûsvê Neviya", dîsa çend cildêd "Hikyatên kurdaye cimetiye" îî yêd raayîn, zendegirtî dunînî: çava, çi teherî meriveki, hema xizmetkarekî mezin jî biya, karî ew meselêd bê hed berew kira, lêkolîna wan bikira, têxistina tertîbê ser dereca ukniye bilind, şirovekira îî neşir kka. Ne "ewî her waxt di timaraiya emrê xwe da ser qulxêd başqe - başqe kar dikk. Di destpêka salêd 30-da di rêdaksiya rojnama "Rya teze" da, di têxnîkiima kurdaye pêdagogiyê da h bajarê Yêrêvanê, di rêdaksiya radîyoweşana bi zimanê kurdî, axriyê - profêsorê 135 fakûltêya rojhilatzanîne ya Ûnîvêrsîtêya Yêrêvanê. . . Zemanekî dirêj ew bibî serwêrê para kurdzanîne ya înstîtûya rojhilatzanîne ya Akadêmiya Ennenîstanêye ulman îî sêksiya nivîskarêd kui-da ya Yekîtiya nivîskarêd Ermenîstanê. Û zêde: Hecîyê Cindî dehan salan bibû karraendê ulmêyî mezin ya înstîtîiya edabiyatê ya Akadêmiya Ermenîstanêye ulman, Şêwra înstîtîiya rojhilatnasiyêye ulmî. endamê Şêwra wêye ulmî îî Ji salêd cahaltiyê ez gele caran bîime mêvanê wê malê. Min mêze dikir çava ew dişuxulî, guhdariya gotûbêjêd wiye aqilbendî dikir. Carekê inin îzin da xwe îî pirsek "dayê", wekî çira ew qet hêsa nabe. Ew bi fen medo - pirço bîi, bi dil kenîya, çava xeyîsetê wî bîi, îî bê laqirdî bersîva min da: "Hêsabûn başe. Lê kê wê dewsa min vê xebatê bike?" Meniya giliyê wî min paşê fem kir, gava min hat zehmeta ewî kişandî bida hişê xwe. Firîda Cewarî pirtîîka bavê xwe bi vî teherî pare vekiriye:



"Gundê min", "Pêşqedemê min", "Zarotiya min", "Koç kirina me", "Di êtimxanê da", "Salê xwendinê" û yêd mayîn. Pirtîik di timamiya xwe da bi beşereke xweş tê xwendinê, lê min heraikî bi hewaskarîke mezin dîsa carekê jî bîranînê Heciyê Cindî xwend. Ewî gundê zai-otiya xwe, Emançayîra xwe zef hiz dikir, digot: "M« zûva Emançayîr nedîtîye ... Ez gelekî mukuriya wî gundî dikim. Minra bûye hisret, û ew hisret li ser kaxezê nayê rokirin. Emançayîr waye - itezîkî meye. Lêyazix, sînore orta me" ... ..Hê di saxtiya Yamançayîrvanê navdar sînorê han hate ve kirinê, lê hemikî ewî nikarî bigîhîştê mirazê xwe, xiyalê xwe banya sêrî - bedhal bî. Roja yekê meha gulanê sala 1990-î Heciyê Cindî di 82 saliya xwe da çî rema Xwedê. Cî - mikanê ruhê wî cinetî be. Ez zor dixwezim eferinê û heyîcanê bêjme Firîda Cewarî, kê jî keda mezin kişand seba xweş bijartina berheman, ya dudyan jî, di zemanê meyî cetin da, waxtê meriv nakevine derdê ii heyîra pirtîikan - îmkan dît wê pirtîikê çap ke. rojnama "Novi vzglyad" (Mêze kirina nû) bi zimanê rûsî, # 3, tebax, s. 2003, Tibîlîsî F.S. Paşî wan yeka ra eferîna min derheqa emelê Firîda Cewarî du - sê bar zêde bî. Di zemanê meyî, nerm bêjim, neçariyê da, ewê rê ii mecal peyîda kirin destxetêd pirofêsor Heciyê Cindî: "Ûsiv îi Zelîxe", "Hikyatên cimeta kurda" (cilda 6), "Diradim" bona çapê hazir 136 kirina îi neşir kirina. Dikarin eşkere bêjin ku Firîda Cewarî karekî hêle îi xêrda dike seba kara folklorê kurdan îi, di timamiyê da, bona bereketa çanda meye netewî. Firîda Cewari ra dixwezim pêşketinê mezin îi jîr bîinê. Bi qedr îi siyanet Mirazê Ûzo Cefarov. s. 2005. Wergera ji rûsî - Keremê Anqosî KAWA NEMIR -ANF Taybet /09:00/02 Gulan 2010 HECIYÊ CINDIYEKÎ NEMIR Heciyê Cindî. Zargotinzan, zimanzan, ferhengzan, nivîskar, wergêr îi rojnamevanekî Kurd e yê ji ferş

heta erş girîng ê nifşekî jêhafî yê akademîsyenî, wêje, çand îî hunera Kurdan; nifşekî ku îro ro êdî hema bêje li ber rehma jibîrbûnê hatiye hiştin, tiştên ku bi ser xistiye zêde nayên bîra kesî, lê nifşekî ku her wekî tirsê Kafka ya bîyîna "Cihîyê gerok", angaştê Kierkegaard a ku derpêş dike, wekî mirov kevirê ku lê hildikume li dikeve, dîsa jî di himdirê xwe de digerîne, rast derxe, li derveyê nexşeya Kurdayetiyê ya fireh, li rexê din ê Erezê, di sedsala 20. de, ya ku Eliot gotiye, "sedsala min a ku her bi şûn de diçe geş pê dikeve", çendî jî kok lê hatibe qelandin, reh û rîşên xwe berdaye nava Yekîtiya Sovyetan ii bûye hût. Heciyê Cindiyê ku di sedsaia xwe de, li ser navê Kurdan, di gefek tiştên pêşîn de bi ser ketiye, kesayetekî bilind e, ku nîşanî me hemûyan daye bê ka tempoyeke xebat û berhemhênanê ya ku mîna bahozê tiraliya rae kajovajî kiriye, tiştêkî çawa ye îî bi raya min, bi xwe dîsa ew kes e, wekî divê bi piyekî leztur em navê v« tevî navên kesayetên bikolin. Kurd î gewre yên ku mîna Kurdên Celadet h Bedirxan, Karairan Bedirxan, Qanatê Kurdo, Erebê Şemo û Pîremêrd li bîra hemû nifşan Yek ji mirovên hemberî mandelkirineke manejiida wê di dîrokê de nehata dîtin bi awayekî bêhempa li ber xwe 137 dayî û hê jî li ber ,\we didin, diyarî cîhanê kirine û yek ji mirovên ku kesekî di hinkûfê wî de careke din zelimet e bê ser rûyê cîhanê, Heciyê Cindiyê profesorê Kurdan ê pêşîn ê li vvelatê Sovyetê, sedsala 20. pê ve, tevî dijiwariyên bi her cureyî, ji gencîneya çanda gelêrî ya Kurdan, parçeyên bêhevta yên mîna kilam, hikayet, destan, qewlik, tiştanok îî qelîbotk, bi pîitêpêdan ii bi rê îî dirbên zanistî berhev kirin û ew ii pey hev di cildên pirtûkan de civandin (î em dikarin bibêjin, wekî wî hema bi tena serê Kurdi ji mirinê rizgar kir, li ser van berhevokên xwe bi Rûsî, Kurdî, Ernienkî û bi zimanine

din dahiîrandinên girîng kir, der heqê wan de binek bend îî aivîsên zanistî nivîsand, bi terapoyeke xebatê ya ku hê jî kesî pêk neaniye, samaneke çandî ya bêhevta ji nifşên Kurd ên dahaiûyê, ji me re wekî mîiate hişt. Ji ber ku wî ev mîrateya xurt bi viyaneke ew çend mezin ji me re hiştiye, îro ro geiek helbestkar, nivîskar û çend mirovên çandê yên nifşê Rewşena ku berhema salên 90'î ye, bi her sala ku derbas dibe re diafirînin ii dibin liût. Heciyê Cindî; qerewêlê nebez ê çanda Kurdî ya devkî ya dêrîn û ya nivîskî, ku hewil dide li bingehên xwe vegere, perên xwe dawêşîne ji qiraviya, ji xunaviya sedsalên xewê û şahperên xwe fireh veke. Heciyê Cindî, li gorî tomarên Sêwîxaneyê Eraerîkan a ku di serê sedsalê de li Qersê hatibî damezirandin, di sala 1908'an de, lê li gorî bîranînên wi bi xwe, di sala 1907'an de, li gundê Emançayîrê yê bi ser Qersê, wekî kurê maibateke Êzidî, heyameke ku .şer, qirkirinê, rev û koçê Ermenî, Kiu-dên Êzidî û Suryanî ji weiatê bav û kalên wan rêş dikir ji dayîk biiye. Heciyê Cindiyê ku salên pêşîn ên zarokatiya xwe li gundê xwe derbas kiriye, di sala 1918'an de, dema ku komkujiyan dest pê kir, tevî qefleyên Ermenî û Kurdên Êzidî, ji hêwa ruh, li tixûb xistiye û xwe li Yekîtiya Sovyetan girtiye. Heciyê Cindiyê ku li ser rê îî dirbên koçê îî cîguhestîbûnê dayîka xwe, bavê xwe, xwîşk û biraycn xwe spartiyê axê, tevî biiTek zarokên Kurd û Ermenî yên pişti konnkujiyê sêwî mayî, li Qersê û Gumriyê, li sêwîxaneyan mezin bûye, li wan dezgehan perwerde bîiye, di sala 1929'an de jî, Dibistana Zanistên Perwerdehiyê ya Gumriyê kuta kiriye. Sala 1930'yî, di Fara Zimanzaniyê ya Zankoya Yêrêvanê de hatiye qebîilkirin îî bîiye xwendekarê ztmkoyê yê Kurd ê pêşîn ê li Sovyetim, ku heyameke wisa, wekî di civaka Kurd-Êzidî de xwendin û nivîsandin bi tundî guneh dihate hesabandin,

xwendekariya wî ya di zankoyê de ji bo civaka Kurd a li wir bûye riidaueke pirr girîng. Cindî, di rojnameya 138 Kurdî, Riya Tezeyê de, ya ku di 25'ê Adara 1930'yê de dest bi weşana xwe kir, wekî serokê Para Çand û Wêjeyê dest bi rojnamevaniyê kiriye, heraan salê, li Ermenistanê, di damezirana Yekîtiya Nivîskarên Kurd de pêşengî kiriye, sala 1938'an jî, bûye serokê yekîtiyê. Cindiyê ku di sala 1933'yan de zanko kuta kiriye, mastera xwe daye î dest pê kiriye li pey hev berhevok î dahîrandinên xwe daye weşandin. Kesê pêşîn ê di sala 1934'ê de benda Kurdî ya pêşîn pêşkêşî Konferansa Kurdzaniyê kirî jî, dîsa ew e. Heciyê Cindî, di heyna Stalîn de, tevî Cerdoyê Gêncî, ji aliyê KGB'yê, ji ber tawanbarkirinên nas î bêbingeh hatiye girtin, lêbelê bi saya serê piştgiriya rewşenbîrên Emienî yên mîna Hiraçya Koçar î Harîityîn Mikirtçyan ji mirinê filitiye. Cindiyê ku digel her tişfî çav ji kulê nedaye hev î dom bi riya xwe khiye, di sala 1966'an de, bi payeya xwe ya profesoriyê ya di warên zargotinzanî ii zunanzaniyê de biiye profesorê Kurd ê pêşîn ê li Sovyetan. Heciyê Cindiyê ku heke em lodek xebat der heqê wî de bikin, em ê dîsa jî nîkaribin layîqî bîranîna wî bibin, bi pirtîkên xwe yên ku bi Kurdî î bi çend ziraanên din nivîsandiye, ku hejmara wan di ser 100'ê re ye û bi sedan bend î nivîsên xwe, raîrateyeke wisa li dî xwe hiştiye, ku era bixwin nexwin kuta nabe, lê bi raya min, 2 berhemên wî yên pirr girîng hene, ku divê her kes ji xwe re peyda bike. Ya pêşîn, berhevoka wî ya gewre ya bi navê Folklorî Kurmanca ye, Qazî Mihemedê ku di sala 1946'an de Komara Kurdan a Mahabadê damezirandiye û di pey re jî li hemberî Farisan têk çûye î hatiye bidarvekirin, ji bo vê berhemê gotiye, "Va ye Qurana Kurdan ev e!" Ya duduyan jî, yekane roraana wî ya bi navê Hewarî ye, ya ku

cara pê.şîn di 1967'î de hatiye çapkirin îî di sala 2008 'an de, bi edîsyona xwe ya standart, bi edîtorîya rain, ji aliyê We.şanxaneyê Lîsê ve hate weşandin îî bi raya rain, ji bo roraana Kurdî parçeyekî bêhevta ye, ku divê her nivîskar îî xwendekarekî Kurd teqez bixwîne. Heciyê Cindiyê mirovê çandê yê gewre yê ku di l'ê Gulana 1990'î de, di 82 saliya xwe de koça xwe ji nava me bar kir, bi vê yekane romana xwe, bi asteke zimanî ya ku bi raya min hê jî gelek romannîsên Kurd nikarin bigihîjinê, çîroka nemir a sedsalekê dinizilîne nava çîroka Fêrîk Egîd Polatbegovê helbestkar ê ku di nava refên şoreşê de jiyana xwe ji dest daye, gilî dike. Mirov ku bi tenê vê romanê bixwîne jî, wê ev xwendin têra me bike, wekî em bikaribin hiş îî derhişê sedsala bîrî fam bikin. 139 Bê guman ji bo ku em bikaribin li ser kelepura xwe bi rastî ii duristî biaxivin, ev hevnasîna ii xwendin ji ferş heta erş ciyê lezkirinê ne! STENBOL BIRANÎNEN MIN DERHEQA FÊRÎKÊ ÎSIVDA Bîranînen xwe derheqa malxwê xweyî rehretî, helbestvanê "Hisref", navdar Fêrîkê Îsivda rain pirtuka Fêrîkê s.2003, paşê pirtuka "Berhemên Usiv ", bi sê cilda - di nava cilda yekêda nivîsîne. Li vir ezê wê nivîsarê bi kurtebirî bînira navê. Zarotiya Fêrîk Parapêda derbaz bûye. Pamp Fêrîkê Îsiv (1934-1997) navbera perçekî tebiyetêyî bedewdane, warê çiya û baniya, çayîr- çîman îî kulîlka: War-welatekî xaraiê xasik, Mikanê kawa, ciyê gulê nazik... Fêrîk xwendina dibistanêra tevayî diçî ber berxa. Zilaraê zîrekî keraal nava tebiyeta şênda dikete raitala, şevêd havîna, li guhêr îî bêdera, raîna kitêba xweye darsa steyr îî peyrê ezmana dixwendin... Ruhê berxvanê biçîik bere-bere bi kubir- keyîsa tebiyetêva perwededibii... Pey xilazkirina dibistana gunde hevtsale, Fêrîk tê qebîl kirinê Xwendinxana Yîrêvanêye pêdagogiyêda. Pey kutakirina

xwendinxanêra, heraa wê salê jî, ya sala 1955-a, bê alîkarî, bi qîmetê bilindva înstîtiita pêdagogiyêye ser navê Xaçatîir Abovyanda fakîiltêta(beşa) fîlolog Iye- dîrokêda tê qebîil kirinê û sala 1960-i ewê xilaz dike. Sala Axavtinên herrojî. 1955-a dîsa bi dest bi weşana bîine rojnama yê "Rya teze bû. radîoyêye kurdî jî Fêrîk radîoyêda, beşa weşanên kurdîda tê kivşkirinê wek serokê beşa edebetê. Radîoyêda Fêrîkê Ûsiv bi helalî dixebifî. Ewî rastgo bû, qebîil nedikir qelpî, derewî, durîitî, nivîsarên sist paşda dida...Karê wî di radîoyêda dirêj nekişand. ^^^^Hv , - ^S', Fêrîk tevî Hecîyê Cind 140 Rojekê Hecîyê Cindî Fêrîk anî xîretê, go: - 250-î saliya şayîrê ermenyayî mezin Sayat-Nova gere bi şaynefî bê kifşikirinê. Were em berevokeke wergera berhemên wî amade bikin. Pirtîika Sayat-Nova da Fêrîk, go: -Tu xwera bibjêre-kîjana tuyê wergerînî, yêd din jî ezê wergerînira. Fêrîk xwend îi wergerand... kilamkî sitia, wergerên xwe şande rojnaraa "Rya teze" îi radîoyê. Bi tercraê Fêrîk kilaraêd Sayat-Nova radîoyêda sitran. Paşê, payîza sala 1963-a, Fêrîkê Ûsiv tevî konkîirsa (leca) qedandina ^ ^ efrandinên Sayat-Nova bii. Gere tevî aktiyorên ermenî yên bi nav pêşda bihata. Fêrîkê Usiv şiyêra Sayat-Novaye "Tu hingêda aqilbendf' bi tercma xwe xwend. Serayê bi hewaskarîke raezin li bejn-bala Fêrîk û bedewya wî dinhêrî. Kerr îi lal, te tirê kurraancî fem dikin, guh dane xwendina wî îi pey xilazkirinêra dirêj, zef dirêj destê xwe lev xistin. Fêrîk layîqî prêraiya (xelata) dereca sisya bîi. Sedirê jyûrîyê, artîstê ennenî bi nav îi deng eyan Avêt Avêtîsyan Fêrîk bimbarek kir, got: - Ez gelekî bona wergera şiyêra Sayat- Nova îi ezbergotina te serbilind îi kêfxweşiml Hema wê salê jî berevoka şiyêrên Sayat-Nova bi wergera Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv hate weşandinê. neferên mala

Fêrîk, 1965 Salal 1968-a payîzê Fêrîkê Ûsiv vegerya gundê xwe. Fêrîk gundê Pampêda bîi mamoste. Ewî dibistanêda fêrên zimanê kurdî didan. Hevtê 2-3 roja gundda dima. Rojêd raayîn li Yêrêvanê bîi, ji ber ku neferê wî bajêrda diman. Salêd 1976-1 980-î Fêrîkê Ûsiv bi proyêkta xwe, tenê bi destê xwe taraek xwe û neferên xwera Pampêda çêkir. Dorê siirek kişand, fêza sîirê jî axilê pêz çêkir. Ji hostatiya wî gund-gundîtî zendeghtî diman. Ewî nivîsî: . . . Û wextekê jî du rênçber wê bîn, Xwe bavên ber siya axilê rainî şên: "Hey gidî, - bêjin, - Fêrîkê rehraeti Ser van tam-taşa çîqa zemet dî. . . 141 Fêrîk çend berx, kar, mirîşkên pir xweşik û du golik xwey dikirin. Ew avayê bi destê wî çêkirî û xweykirina heywanet jî, meriv digo, beşeke poêzîya wî bîin. Fêrîk mhmâl bû: "Dilê min wire, kîderê kalîn-pîşkîna pêz tê..." Ewî her tiştê xweşik- tebiyet bi çîya û banyava, mêrg û çayîrava, heywanetava, çivîkava hiz dikirin, heta berx, kar û mirîşkên wî jî pîrr bedew bûn. Lê qîz û bûkêd bedew? Fêrîk zû bengî dibû. . . Ewî nivîsî: Zidbîiyî ji hevaltîya hulîkar, Ez xwera xwey dikira hijraekar Birre dîk-mirîşkê reng-rengî: Yek çîle qerqaşe, fîne bîr Gultimê berfa der biharê, Yek zîlîya amojina mine pîr, Yek-rengê hingilê hegarê. Yek reşe raîna siya neqevê Kuraikê sor xaşxaşke li hafe, Yek xuraira dorbenda xevxevê - Wereq dide raînanî alavê... Fêrîkê Ûsiv bê hed û hesav gundê xwe-Parapa kurda hiz dikir. Pampêda ewî xwe li perçekî Kurdistanêda didît. Fêrîk selmyanekî milletê xwe bîi: Bra xwezil Kurdistana min şên bûya Milletê min aza, xwendî û zên bîiya... Ewî hiz dikir tevî kal îî pîra seheta qîsa bike derheqa walêt, koçerbûna wan, ji erairê berê. Û helbestên xweye hisretê îî welatparêziyê dinivîsîn, çawa " Mistefa Barzanîra", "Xiina milletê min", "Kurdistan", "Kurê minra" û yêd din. Ewî wek yekî rê unda kirî, bi hisreta kîir digo: Kurdîm,

kuyî Kurdistan, Wey dîl û bindesta min... 142 Piştira nivîsî: KURE  
 MINRA Car-carana têra, raelîl, dikor îî rairîiz im, Lawo, kerba binê  
 lingê te radimîsim. . . Şaş neraîne berxikê min. . . Eh, kî zane. . .  
 Dinê heye kaşkişika dest îsane, Dibe rokê Kurdistanana xopan vebe,  
 Bavkê teyî hisret dil da lê tunebe. Bira henge lingê te bi hisreta  
 min, Bigere nav ax-topraxa cimeta min. Fêrîkê Êsiv jiyana xweda  
 pirr hate zêrandinê. Ewî pesinê qeydê sovêtiyê ii jîyana merivê  
 sovêtiyê nedida. . .Pirtîkên wî bi zore-zor ii bi cefa çap dibûn. "Ew  
 çi seqeme?", "Ew çi derde?", "Ewî çawa turîş kirîye, nivîsiye, wekî  
 kulfeta kurde sovêtiyê naxweze mêrê wê here şêr...", "helbestên  
 Fêrîk yê "ekisîsovêtiyêne", "eksîmorolîne", "Fêrîk ne şayîrê  
 zemîne"... Hey civînên nivîskarên kurdada derheqa van tiştada  
 digotin, berevokên helbestên wî paşda didan, çapkirina wan şînda  
 dixistin, didane guhastinê. . . Hemîn çevnebarî, eraîsî û nezaniya  
 hineka jî alîkîda "kardikh". Çerkezê Reş, ku xêrxazê Fêrîk bû,  
 nivîsiye "...îî helbestvanekî mîna Fêrîkê Usiv, ku serdapê îsaf bû,  
 dest neyara hergav dizêriya. . ." Ê tenê raiisayê wî - hewasa  
 nivîsarê, dihate hewara wî: O, mîisa min, o, çara min. . . Dema tu  
 têyî hewara min, Min tirê wekî Rostemê Zal Ji minra dibe pişt îî  
 heval. . . Lê wexta Ax, mîisayêd min wexta ji min dîirin- Fiqarekî bê  
 piştovanun ez, Wextê li dor rain li hev difiirfûrin- Qey hingê  
 Rostem pelewanim ez. . . Xwestinek wî ji Xwedê hebîi: 143 Xaliq,  
 xatirê navê xwekî, Min hewcê meriyê nemerd nekî: Te bîter kirîye  
 kul îî birîn, Tu bi xwexwe jî bicebirîn. . . Halê Kurdistanê, bindestî îî  
 perçe-perçe bîina wê ji nexaşiya jî zortir Fêrîkê Êsiv dizêrandin îî  
 dil- hinavê wî şayîrê nazik dêşandin... 3-ê gulana sala 1997-a pey  
 nexweşiya giran ra, 63 saliya xweda, şayîrê emirhiz xatirê xwe ji  
 cihana ronik xwest. . . Bi xwestina Fêrîkê Êsiv ew berpala çiyayê



gundê wî Sîpanê yê Dibûrî hate definkirinê, weke wî dixwest: . . .  
batan kerî, batana siîrî Dora tirba min çiyayê Dibîirî - Hingê mhê  
min-berxvanê berê, Hêlbiya hisreta xubara qebrê. . . , Tevî kerê pêz  
ji çiyayê bilind, Êvara bata belabya nav gund. . . Onîkê bhê Fêrîk  
tevî lawika hewşa meda ya gund çadir lexiştibîin, îi pey  
definkirinêra bona mêra me textê xîrê wî çadirîda danîbîi, lê textê  
jina - oda me mezinda. Ber êvar bîi. Hewa xweş bû, ba tunebû.  
Gişk bela bûbûn, çend jin raabîin, hinek hewşa meda, hinek jî  
kêleka min odêda runiştibîin. Min bîna dîi texmîn kir ii dilê xweda  
fikirîm, wekî lawik çîine ser raezel, agir vexistine, lê fikirî rainra wê  
lezê derbaz nebîi: raezel ku, raala me ku? Hema wê demê, Zîna  
jina Şikoyê tiyê min ji dei-va xwe avîte hundurê malê îi minra go: -  
Te qe dî ci bîi? Min bi tirs go: -Zînê, bêje, çi biiye? Go: - Hela derê  
derva, qe ba heye? Ez lez derketim, rain go:- Na, wele ba time,  
êvareke Parapêye xweşe. Go:- Lawikên rae çûbîin ser mezelê Fêrîk  
agir dadabîin... Dîna me çend jina jî raezela bîi. Me dî dûyê agir  
hilkişya jor, hev girt, paşê 144 riya xwe guhast û... ber bi mala  
Fêrîk hat... Hat, haf xwe h avayî xist, bela bû, çîi. . . Salek bû, ew  
yek ji fikirî min demediket, ez difikirîm: "Welle, ew çi sêr bûye?  
Paşê mm rojnama "Rya teze"da (29.04. 1998) gotarek derheqa wê  
yekêda nivîsî bi semavê "Gelo ew sêr wê bê şirovekhinê?" Piştira  
Zîna jmfî gilî dikir, wekî çend merivê ji gundên dora Pampê ji wê,  
Naza qîza wê pirs kirine, gelo nivîsara nava rojnaraêda raste? Digo,  
rae jî wanara digot: -Welle, rae ew yek ber çevê xwe dîtiye. . . Sala  
1969-a bîi, bona berevoka Hov. "Efu-andinêd Tûmanyar Bijare"  
nivîskar yê îi helbestvanê ermeniyayî raezin helbestvanên kurd  
wergerê xwe yê ser zimanê kurdî dibirine weşanxanê, ji ber ku  
biryar danîbîin, ku ew berevok gere sala 1970 bê weşandinê. Fêrîk

Mîkaêlê Reşîdra hevaltiya nêzîk nedikir, lê tira bi xêrxwazî ji wî xeber dida, cama jî pêra bi têtêfonê diaxivî. Rokê min texmîn kir, wekî Fêrîk tevî Mikaêl bi têtêfonê xeber dide ii Fêrîlc dawiyê jêra go: - Ca, kereraa xwe, ji wergera xwe ya "Anîiş"-ê minra çend rêza bixiine. Ê Mîkaêl, bi dilê sax, jêra xwend. . . Berî êvarê Fêrîk go: - Min şerpeze nekin, Mîisayê min hatiye, ezê binvîsim. . . îda kê diwêrbî jê xeberde? IJ ewî nivîsî..., diha rast destana "Anûş" ya Hov. Tîmanyar werdigerand ser zmianê kurdî. ... Piştî xilazkirinê, min jêra go: - Ê iie duh Mîkaêl tera wergera xwe ya "Anîiş"ê dixwend? Go:- Wergera wî min xweş nehat... û nişkêva xwestina min ya wergerandinê awqa zor bîi, ku min xwe zeft nekir iî binhêr çî to tişt jê derket, got,- û xwend. . . Rasti jî wergereke zef baş bîi . . . Lê ne bi dUê min bîi, min go : - Te gere werageranda. Mîkaêl wê ji te bixeyde. . . - Heyran, çira gere bixeyde? Axh ne gunê raine, hewasa min hat, 145 mm jî wergerand,...-paşê, go,- tu zanî, wekî helbest, destanên baş kî bixweze dikare wergerîne ser ziraanê xwe. . . Pirtîk çap bîi. Destana Hov. Turaanyan ya "Anûş" bi wergera Fêrîk wêda hatibî bi cî kirinê. . . Paşwextiyê Mîkaêl Fêrîkra gotibî: - Weke helbestvan ez qedirê te zanira, lê weke caraêr te neheqî li min kir. . . Sala 1985-a Mîkaêlê Reşîd çî ser dilobaniya xwe. Ê Fêrîk nivîsî: MÎKAÊLÊ REŞÎDRA Tu çîyî, pismamo, tu çîyî, Bi qewlî gotyava, dinya "heq", Era hela kh--kaş îi kamçobîyî Mane vê dinya han neheq. . . Emirda aqas jî dil û ced Me şurya hevaltiyê nedikir, Lê tim jî, lê tira jî bi hisret Min mêla xeysetê te dikir. Min nava mitala xwe nilrda Li taxek Pampa xwe hizkirî Çêdikir ji tera zef zîida Tamekî tîfînî kilskirî. Wî gundê bedewî bilindî Em diçîm sersal îi eydê hev, Ê li ser kulavê kuraiancî Guh dida rae şiyêr îi beytê hev. Rojekê niviskarê ermenî,

doktor-profesor Harûtyîin Mikirtçyan hatibîi mala bavê min, pirtîika xwe anîbû diyarî bavê minke. Ez îî Fêrîk jî li wir bûn. Bavê min razîbîina xwe îlanî wî kir, paşê go: - Fêrîk, lê tu zanî, wekî Hariityîin wexta sûda me, tevî Hiraçya Koçar, mîna birê helal pişguya min kirin. . . - Heyran, -ewî go,- rain tenê rastî got. . . Wan sala min Yekîtiya 146 nivîskarada kar dikir, wek katibekî Yêkîtiyê hatibîime hilbijartinê. Hecî minra go: "Dixwezim pirtîikên dersa îî çend rojnamên Rya teze bişînim Sûryayê, Bedirxanra. Min jî ji karkirê (navê wî vê demê nayê bîra min) Partiya komîinîstiye pirsî kanê era dikarin pirtîik û rojnama wanara bişînin? Ewî go: "Eze sibê bersîva te bidim". Hilbet, ewî jî ji mezinê xwe pirs kiribîi, îî piştî du roja ewî gazî min kir, go: "Hevalê Mikirtçyan, hun gere xwexwe wan pirtîik îî rojnama bişînin. Bişînin, bera bizanbin, wekî li Ermenîstanê çî to mecal hatine saz kirinê bona pêşdaçîiyîna çanda kurda. . ." De, piştira, Hecî pirtîikên dersa, çend hejmarên rojnamê anîin mala niviskara, adiresek jî da rain û rain jî ser wê adirêsê şand, adirês jî bir da wî hevalî. Ev bîiye rasfî! Dadêda rain derheqa vê yekêda got îî dubare zêde kir: "Bi destûra dîwanê rain bi xwe bi riya postê pirtîik û rojname şandine Sîiryayê". Fêrîk go: - Bira xwedê komeka werabe, We mêrxasîke mezin kirye, dibe yekî din bîiya ji tirsaxwe qe neçîiya dadê, yanê ji her tişt inkar kira. . . - Ê, go, kurê min, lê hevaltiya helal, birafî wê ku bimana?... Xeberdana Hariityîin Mikirtçyan kete bîra min, dema peyî wefatbiina bavê min ra min nasiya xwe da Sîixul (dosiya) # 7623, ya girtina bavê xwe. Ez difikirîm: "Gelo ew hejmarên Rya teze û pirtîikên dersa gihîştibîin destê Celadêt Bedirxan?" Ez gelekî dilşa bîim, wexta piştî çend sala min bersîva pirsaxwe di gotara Têmîirê Xelîl da, ku rojnama "Dema nîi" da sala 2008-a hatibîi weşandinê,

xwend. Têmîirê Xelîl nivîsiye: "...Gava kovara kurdî ya delal "Hewar" destbi weşana xwe dike, çend hejraarên "Riya teze" î hinek pirtûkên kurdî yên li Yêrêvanê derketî ji wanra têne şandin. Kovar hejmara xwe ya 8-a da (sala 1932a) nivîsa Celadêt Bedirxan (bi nasnavê Herekol Azîzan) ser vê raelê çap dike. Era binhêrin çika li v/ir çî tê gotine: "Rojnaraeke kurraancî bi herfên nii bi kurmancîyeke xwerî li Rewanê, di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gihîştine destê me. Çevên rae pê biruhn bûn, dilê me şa ii geş bû. Kurmancên Rewanê ji rojnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê-çar riija mijîlahîya xwe bi wan kirin. 147 Ji nav riipelên wan ên teze îî ter bîhna kulîlkên çiyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapikê kurmancî, xencer îî piştencera kal îî kalikên rae dihatin dîtin". . . \*\*\* Deraa civîna beşa nivîskarên kurda dibî, Fêrîk minra digo: - Biliv, era hevra herin. Êzjîdîçîira. Carekê tenê çîbî civînê. Hat, rairizkirî, hêrs. Rîinişt, tiştêk nivîsî, dura qelaşt. Pa^ê go: - Zanî, ez îro civînêda dilê yekî ketira. . . - Tişt nake,- rain weke ten gotê,- wê bibaxşîne te... Gelo eva îda cara çendane tu dilê xelqê dikevî? Go:- Bese, tera xebardan nave! Paşê xwe mukur hat, go: -Wele, xwedê çira carina raeriva şaş îî feş dike? Vê dinêda her tişt poşmaniye. . . - got îî nivîsî. POŞMANÎ Bibaxşîne, birê delal, Ku bi pirsek tel Min dilê te kire xiyal, Tuhiştîmetel... Ax, emirda tucar usa Sert nîbiime ez Ê negotiye hê tu kesa: "Xiravî, tu nes". Min dil weke belgê gulê Usa nerra bîi, rem, Meriyêd kirêt, hewa çUle Lêkirin seqera. Ê gula min qincilî hev, Xubar rîinişt ser, Çamiqarê tiimê wê tev Kelemdane der... Ê ez naha gele sertira, Neyî xeber xweş: 148 Minê tirê gişk bedbextin- Meriyêd teleqreş. Min nizan bîi-hene, zefin Yêd raîna

te qenc, Û emîisîyê wek raerê reş DUnedayepenc... Nivîsara xwe ber rain xwend, min go: -Nebîi, tu hema ji yekî baxşandinê dixwezî? Go: - Na, na!... Ez dixwezim, wekî ez dilê kîjan raerivî ketune, vê helbesta rain bixîine û texraînke, ku xîit bona wî min ev helbest nivîsye... \*\*\* Sala 1973-a destana Fêrîk "Ûsivê Nevya" hate weşandinê. Ew veçêkirineke beyt- serhatiya cimetêye tezeye îi bi serecema xwe pîrr dewlemende. Vê destanêda dîhar bîine karebiinêd şayîre lîrîkîyê, êpîkiyê û draraatîkiyê. Fêrîk gilî dikir, çawa carekê ew teldê mala xwe, ber kuçkê kartola paldayî bîiye: dinhêre du lawik ji aliyê kewşênva têne gund... Peyî silav-kilavara jê dipirsin: - Gelo raala Fêrîkê Ûsiv kîjan tangêye? Fêrîk divê: - Kererakin, pêşda werin, em van kartolê pijyayî bixun, paşê ezê ji wera bêjim. Lawik tên, riidînên ser şînkayî, çend kartola bi hewas hoçê nanê loş da dixun. Paşê razîbîina xwe elara dikin, destiirê dixwezin, wekî herin, Fêrîk bivînin. Li wir Fêrîk divê: - Eva mala Fêrîke, Fêrîk jî ezim! Ewana zîir dibin -wî dinihêrin. Dibe pîrçîna wana, dikenin, xwe davên pêsîra wî, paç dikin... Gifî kiribîin, wekî xwexwe ji Tîbîlîsîyêne, hatine Camîişvana Çîik havîngehê. Destana Fêrîk ya "Ûsivê Nevya" xwendine, pîrr begem kirine, lema jî hatine Pampê- dîtina Fêrîkê Ûsiv. 149 \*\*\* Zivistana sala 1984-a bû. Şev ji zengilê têtêfonê ez hişyar bîim. Sehîdê îbo go:-Xîişkê, xwe razayî nîbîin? Ez pê hesyam, wekî Sehîdê îboye, min go: - Birê rain, vê şevê, te xêre? Go: -Şikir xêre, go rain destana Fêrîk dixwend... Fêrîk îda ber têtêfonê sekinî bîi îi dibihîst, tetika têtêfonê jî destê min girt ii bêsebir ji Sehîd pirsî: - Sehîd can, te vê şevê kîjan destan dixwend? Go: - Fêrîk, rain "Rihana Reso" xwend, ew tiştêkî xwedêtiye... Ewê hukuraekî mezm ser mm hişt, kêfa min rabû îi min qe sehetê nenihêrî îi usa dereng tera têtê xist. Bira qelema te

adanbe îî tu hertim me şakî. . . Fêrîk gotê: - Xwedê komeka terabe...go, Sehîdê pismam, hi bizanbe, wekî te ez pîrr kêfxweş kirim, ez zef ji birayê xwe razîrae...- îî wê şeva dereng Fêrîk dîsa destana xwe vekir îî xwend. . . Sala berê, havînê weke hergav era raalêva çîbîine Pampê havîngehê. Fêrîk bostanê xweva rajûl bû. Biraziyê Fêrîk ji ser riya şoşê kire gazî: -Apo... Xortek mala te dipirse. Fêrîk go:- Bîne raalê. . . Hatin, dêstda çend hejraarên rojnaraê hebiin. Peyî silav- kilavara ji çeltê xwe dîktafon derxist, go: -Apo, kereraa xwe bersîvên pîrsê rain bide... Fêrîk go:- Kurê apo, usa nabe, tu hafî raala rain, ca sebirke, bêje tu kêyî, piştira parî nan eraê bixun, dîira ezê bersîvê te bidira. Me jî îda teştê xaribîi. Fêrîk min îî Zerêra go: - De rabin, texte daynin. Wê sibê mirîşkê me şeş hêk kiribîin. De me hêkerîina wan şeş heka çêkir, ji bostanê xwe pincar anî, paşê çeçilraast çêkir, nanê loşva bir danî ber raêvanên xwe. Ewî Fêrîkra ida gilî kiribîi, wekî ji Lênîngradê hatiye, xwexwe korespondênte... Mêvanê me nanê xwe xwer, razîbiina xwe mera go, paşê go: -Apo, em destpê kin? Fêrîk go:- Keremke! Ewî dîktafon pêva kir, go, wekî îro hatiye gundê Sîpanê û 150 mêvanê nivîskar Fêrîkê Ûsive îî ji Fêrîk pîrsî: -Kek Fêrîk, em zanin, wekî te helbestên kilasîkê ermeniya û rasa wergerandine ser ziraanê kurdî, lê te bi xwe gelo helbest nivîsîne? Fêrîk go:- Kerema xwe, pîrsa xwe dubareke! Ewî jî, bi dilê sax, pîrsa xwe dubare kir. Me texmîn kir, ku Fêrîk hêrs bûye îî. . .Fêrîk ji ciyê xwe rabîi, bi dengêkî sert go: -Ca hema vê lezê ji mala min derkeve here, wextê min tune, bostanê kartola benda mine îî rind zanibe, wekî nezanara ez xeber nadira. . . De, lawikê raêvan hêrsa Fêrîk texmîn kir, ecêbmayî rain nihêrî, dît, wekî ez jî berxwe ketîme ii giliyê min jî wîra tune, lezobezo tevî bkaziyê Fêrîk ji malê derket. . .

Fêrîk go:-Zei-ê, qîza rain, te hêkerûna çend hêka hazir kiribîi?- îi gava pê hisya, wekî "şeş hêka", go,- heyfa hêkê rairîşkê me...- got ii kenya... Min xwe zeft nekir, go: - Qe ne cayîz bû, te wî lawikka usa xeberda, ciwanbîi, nizanbû, wekî tu helbestvanî, te jêra bigota, pktiikê xwe pêşkêşî wî kkana. Xwedê xêrke, qurebîina te. . .,- xeber devê rainda, Fêrîk derket ber dêrî, dît, wekî biraziyê wî bi wî lawikîra ber bi şoşê diçin, kke gazî, go: - Xidk, Xidiro. . . mêvanê minra dagerin werine malê. . . \*\*\* Havina sala 1994 em gund da bîin. Em pê hesyan, wekî şev Gotine: " Têlêgramê bide pohsiya hatiye Memoyê tîyê min bkîye. kurê xwe,bira ji Rûsyayê bê, here eskeriyê qulix bike, gotibîin- yan na, emê te bivin bigirin, heta kurê te pê bihese û lêde bê. Memo gotibîi: - Ez adiresa kurê xwe nizanim,- îi Memo hildabûn xwera biribûn. Derheqa Memoda hatin Fêrîki-a gotin. Fêrîk pirr xemgîn bîi, heraa berbanga sivê rabîi çîi navça Saxkahovîtê, bal serokê polîsiyê. Zef hêrs jêra gotibîi: - Birê min temenê xweda raezine, zef nexweşe, eger tişteke lê bê-hûnê bersîvê bidin? De li nawça Saxkahovîtê Fêrîk wek helbestvanê bi nav îi deng zanibîin. Memo berda bîin. Lê Baxçoyê kurê tîyê minî Teyo jina xwe Etêra hatin rica Fêrîk kkin, wekî şev 3-4 roja bên raala meda razên.Etê digot: - Kî zane, dive îşev jî bona kurê me ben pey Baxço, îjar wîya xwerabivin. 151 Fêrîk go:- Neferê min hatine, ciyê me tenge, lê şev werin, eraê yole herin. Ê 2-3 şeva raala meda razan. Ez zef bînteng dibîim. Fêrîk texmîn kir, go: -Esêvanî tii ne dota meta Zeynevêyî, dayîka te çiqqa bîn fu-e bîi, çiqqa merivhiz: lê ew çawa bû ji gunda dihatin bi meha mala weda diraan, ewê oda biçîik dida mêvana, lê hîin hevt neferava odekêda diman? Ê kete bîra me, wekî ji Parapê Teyo, Egîtê kurê xatiya Kidê, Ezîzê Eşo zemanekî raala raeda mane, çîine kîksên raiîhesaba

(biîxaltêriyê). Û dayîka rain qe rokê bêhna xwe teng nedikk, serda jî xarina wan çê fikir, kincê wana dişîşt. Hemoyê tîyê min jî gere salekê biçîiya dibistana polîsiya. Dîsa mala meda dima, lê çar mehê din go: -Apê Hecî, îda bajêrda teyax nakim, bîra gund dikim, ezê herime gund,...- îî çii. Paşê kete bîra me çawa Teyoyê birê Fêrîk Porsora yekî dinêra nîşankkî revandibî, hatibû mala bavê min, digot: "Heta apê Hesen û Ûso wanara pev nekevin, em nUcarin herine gund",- îî êmanekî dkêj mala raeda man. Lê wexta xatiya Zevo tiraê çend roja tevî jineke gundê xwe dihate raalê? Xatiya Kidê dihat, nas û nenas dihatin -dê îî bavê min tim beşerxweş ewana qebîil îî verê dikirin. . . Kete bîra min, min ji xwe şerm kir, û. . . ji wê rojêda min Baxço îî Etê bi hizkirin îî beşerxweş qebîil fikir, û ewana du roja jî zêde man. Wexta era vegeryan, hatine Yêrêvanê, min diya xwera derheqa vê yekê da got. Ewê go:- Qîza min, tu rastî jî yeke bêsebir û bîntengî. Usa ne pake, lawo. Mêvan mêvanê Xwedêne...Tu çira bînteng biibûyî? De ez, hilbet, şame, wekî Fêrîkê zeva mêvanhizya me bîr nekiryê îî aniye bîra te. . . te bîr kiribî, çawane? Salekê Xalê Ûsiv ji gund hiriya firotanê anîbû Rewanê. Hirî firotibî îî piştî nîvro hate raala me, pesinê xwe da, wekî heraa 4-5 sehetada ewî karê xwe xilas kirye, naha jî hatiye dîtina me û wê seheteke dinê rêkeve, here gund. Piştî xwerina nan Fêrîk go: - Ûso, dibe avto rastî te neyê, çîiyîna te şerpezebe, terî bikeve erdê... Ji Elegezê teriyêda tuyê peya çawa bigihîjî gund?... îro raalda bimîne, sibê, silaraetî, tuyê herî. 152 Go: - Na, ezê herim, eger heyra mindanî, rave em hevira herine gund. Û çîin. . . Ferîk, gava piştî sê-çar roja ji gund vegerya, gilî kk, go: - WeUe, bextira, avtok rasti me hat- dar dibirin Elegezê, em kêleka avtoajo siyar bîin, çîin. Rêva mêrik ji Ûso pirsî: - Kîrvo, (yanê: kirîv) ev çiyê



nava torbê teda? Go:- Perene... Bîi pîrqîniya mêrik, kenya, go: - Welle, kîrvo can, laqirdçiyî, ha. . . Gihîştine Elegezê, ji avtiya mêrik em peya biîn, Êso devê torbê xwe vekir, perê riya me ji wir derxist îi da raêrik. . . Mêrik şaş-metel mayî, rae nihêrî, go: -Kkvo, eger min bawer kira û tu jî tenê bîiyayî, inin zanibîi minê çibaniya serê te... Iiso go:- Kurê heyf, welle vê carê ji destê te çû. . . Ê em hevra kenyan, piştira xatirê xwe jî avtoajo xwest îi em peya ji Elegezê rê ketki ber bi gund. ^ H^ ^ Wezîrê Eşo bkanînen xwe da nivîsiye: . . . Şaykê me yê mezin Fêrîkê Êsiv bi heykanmana . deng û seda dengbêj Şeroyê Biro ra helbesteke gele ,T " xweş avîtiye ser wî, ku bawera dilê min da sertaceke helbestên kurdî dikare bê hesabandinê. Deraa nixandina vê helbestê em gotî tiştê herî raîihîra jî bigkin ber ku ber hesêb, wê yekê, ku Fêrîk ew despêka wê helbestvaniya xwe da nivîsandiye, hê di sala 1958 da. Ji nava bîranînen Firîda Hecî navê helalê Fêrîkê Êsiv derbaz dibe, ez ber vê yekê jî pêwişt W. Eşoû F. Êsiv s.,1956 dibînkî di nava vê pirtîikêda helbesta Fêrîk ya bi gemavê "Dengê Şero" bînim navê: DENGÊ ŞERO Dengê Şero perweze bîi U van kona, şên û dîiza, Go: "Hekîmo,maUieraekê, pêşkêşa te raemUcê qîza". Agk girte dilê xorta, van cahila, van tîinsiza, Feqiyê Teyra tirbê rabû îi Dîlbera xwe raraîisa. . . " 153 Dengê Şero kire zingîn, çîî gUîîşte erşê ezraîn. Ji hewas îi hijmekariyê cî lerizîn pêvir îi raêzîn, Berfa heçê Elegezê- ku hê nedye bahar, havîn, Te go, heliya îi jorda hat, çera îi cewa kke xulîn. . . Pîrê diha li dev gorê, bi rû-hedera kalê zeraîn,- Dilê wan jî tev hevdu bûi îi evîntiya xwe bk anîn. . . Dengê Şero, te go, gUîîşt heylo Sîpan ii Cizkê: Rabîin hevra kirin sowbet Mem ii Zîne ji kibîrê. . . Te go, Xecê rabîi îi got: "Sîyabend, rabe, hatiye bahar. . Dengêk pêra ji wêda tê, ez mam hewas îi hijmekar. Dibê:

"Hekîm, hey hekîmo, dîi-demianê xwe tu hilde". Rabe Sîyabend, belkî hekn bicebirîne birînê te. . . Kubra Şero perweze bî li van kona, şên î dûza, Bengî Fêrîk bî sewdeser, hilda hezar hub î miîsa, Go: "Bistirê, Şero, bira, dilê min bî kûra êgir, Ez tê nabira kilamê te, ku helandin berê kêvir. . ." Hecîyê Cindî raehên emirê xweye dawiyê kê xeber dida, me ew neda xeberdanê -xeber nedida. Xwera mitalada kerr ii lal rîidini.şt. Fêrîk jî hiz dUdr kerr î lal kêleka wî rîinî î lê mêzeke. . . Rokê Fêrîk helbesta xwe ya "Hecîyê Cindka" bal wî xwend, bavê min kerr vebeşirî. . . HECÎYÊ CLNDÎ RA Na, demekevim vî şherê hana, Negerim li van sûk î meydana, Nekevin guhê min tu deng î dew, Nevînim bengzê kulfetê bedew. Nixta rain şêlî neke tu qkêj, Li rex wî riinêm, mêzekim dirêj. . . Sufetê wîyî helal, edilî, Siifetê Hecîyê Cindî ya dawiyê meha adarê, Qam û qedemê kevnî ritilî- Dapale ser rain mhê rehetiyê, sala 1990 Ê. . . xewra herira hetanî-hetê. . . 20.03.1990 154 KILAMA ÇIYANO (cazbendî ya Yê. Sardaryan, xeber yêd Fêrîkê Êsiv). Xên ji vê kilamê, kilaraek Fêrîkê Êsiv jî heye, ku xudanê xeber û raiizika wê ew bi ....: xweye: "Tuyî minra kilam", (hatiye weşandinê rojnama Rya tezedê), 23.01. 66. Nava berevokên berhemên Fêrîkê Êsivda ( bi sê cilda) ev helbest jî; Evara çiyê, Rya teze,28.07.66 ii têt",Rya reze, "Çawa hevdu 13. 10.60 nehatine weşandinê. 155 \*\*\* 2-ê meha mijdarê sala 2009 tamam bû 75 saliya ji dayîkbûna Fêrîkê Êsiv. Wê salê derheqa Fêrîkê Êsivda gotarên nîi ketine destê rain î rain biryar danî wan gotara nava vê pirtîikêda bi cî bikira. fotoyê F. Êsivî dawiyê, s. 1997 Me xwest sivta gotara Rohat Alakom kurt kira, lê ji ber ku ew nivîsara dîrokiye, me hişt. Min raaqul Rohat Alakorara nivîsî: "Navê gundê dayîka min Engîkê bîi, lê nava nivîsara weda ew gund nayê bîr anînê". Rohat Alakoraê

raaqîil bersîva rain da: "Di wê lîstêya sala 1889 an de navê gundê dayîka te îî navê gundê Hesencano jî tune. Çiraa wisa bîiye, ez pê nizanim". NETKURD Aktuelbûn: 2009-11-21 09:53:46 ROHAT ALAKOM DESTANA "RIZAYÊ KURMET" ENÎNIVÎSA EZDÎYÊN QERSÊ Dîrok îî serpêhatiya kurdên êzdî li Serhedê gelek balkêş e. Di pirtîika min a li ser Kurdên Qersê de beşeke dirêj li ser kurdên êzdî ku li derdorê Qersê diman, hatiye nivîsîn. Di beşa pirtîikê ya bi navê Serpêhatiya Qersê ya Kurdên Êzdî zêdetir dîroka wan a li Qersê, berî koçkirina sala 1918an hatiye sekinîn.[1] Mîsyonerên swêdî ku di dawiya sedsala 19 îî destpêka sedsala 20an de li herêma Serhedê gelek aktiv biine, wan beşeke serpêhatiya van kurdên êzdî derbasî ser kaxiz kirine.[2] Ezdîyên Serhedê her wisa di van salên dawî de bîin mijara lêkolîneke fu-eh ku ji aliyê lêkoler Pîr Dîraa hatiye nivîsîn.[3] Êzdiyên Serhedê li deverên Surmeli, Bazîd, Ayintap[4], Qaxizman (li aliyê Sînekê), Dîgor, Rewan ii Tiflîsê her war guhartine, çawa dibêjin: "Afe du miriyên xwe li cîhekî gor nekirinV". Piştî serobinobîin îî hilweşîna Sovyetê, kurdên êzdî vê carê li heraiî cîhanê belav bîin. Li Rusyayê, 156 Alraanyayê, Belçîka, Fransa, Awisturya, Swêd îî gelek welatên raayîn îro koraên êzdiyên ji Sovyeta kevn hene. Van kurdên Serhedê di nav dused salan de çar-pênc caran war guhartine, derodero bîine, wek koraeke dîirwelat, derwelat yan jî bêwelat hatine nasîn. Lê belê ew wek eleraenteke DNA her diçin dîsa li çanda xwe, erf-edetên xwe îî li koka xwe vedigerin, her wek xwe diraînin. Kakilê çanda wan neguhirbar e, winda nabe. Gund Mîllîyet Mal Mêr 102 63 Jin Qizilqîile Susiz Bocalî Kurd Kurd Kurd Kurd 23 12 88 60 75 51 44 60 58 90 47 74 23 13 11 19 17 103 51 42 75 72 Enîkoy Duzgeçît Kurd Kurd Kurd Yemençayîr Şirînkoy Şatiroxlî Kurd Kurd Kurd 26 18 15

13 22 20 24 113 54 Qereqela Êzdîya Siçan Yayle Qozulce 69 50 91  
96 Kurd Kurd Kurd Kurd 40 88 Dîgora Xerebe Kosesogutlî 96 95 96  
Nifusê 14 gundên êzdî li herêma Qersê, angorî agahiyên sala  
1889an (Karsskaya Oblast - Svod Statistiçeskşix Dannix, Komîteya  
Îstatiskê ya Kavkaz, Tiflîs, 1889) Di dîroka kurdên êzdî de navê  
bajarê Qersê ku li Serhedê dimîne, navekî naskiri ye. Ew kurdan di  
salên 1918an de berî ku herin Erraenîstan î Gurcistanê, li Qersê  
diraan, li derdorê Dîgorê çend gundên wan hebîin. Di wan salên  
revî bezê de hin raalbatên ku canê xwe xelas kirin, derbasî  
Erraenîstan î Gurcistanê bîin. Bi salan li wir hêwirîn. Ji xwe re  
jîyaneke nîi saz kkin. Bûn xweyê dkokekê. Van kurdan paşê dîroka  
xwe ya li Sovyet baş qeyd kirin, derbasî ser kaxiz kirin. Tenê ew  
koleksiyona rojnameya Riya Teze bi serê xwe çavkaniyeke  
bêhempa ye, nêzîkî 5000 hejraarên wê derketine. Her wisa jî gelek  
lêkolîn li ser jîyana wan ya Sovyet hatine nivîsîn. Lê belê tişteki  
balkêş e ku dîrokzan î lêkolerên kurdên Erraenîstanê di derbarê  
dkoka bajarê ku jê hatine, ango di derbarê bajarê Qersê, kurdên  
Qersê 157 de kêmtîşt nivîsîne. Dema ku Qers di nav sînorê  
Rûsyayê de bîi (1877-1917) bi sedan lêkolîn ji aliyê rûsan hatine  
nivîsîn. Çawa em fer dibin di van salan de salnarae î rojnarae bi  
riisî li Qersê derketine. Wek mînak rojnameyeke bi navê Kars ya  
heftane bi salan li Qersê der çiiye. Hejmara pêşîn di sala 1883an  
de hatiye weşandin î heta salên 1917an her berdewam kiriye. Ev  
yeka tê wê wateyê ku di nav van sî salan de nêzîkî 1500 hejmarên  
Hema ev wê hatine bi weşandin. serê xwe rojnarae hêjayî  
lêkolîneke dîrokî ya doktorayê ye. Di nav riipelên wê de qala  
kurdên êzdiyên Qersê jî tê kirin. Lê belê çavkaniyên kurdî ewqas  
behsa vê rojnameyê nakin. Ev sûreta, komeke kurdên êzdiyên

Qersê nîşan dide, sûret berî koçkirina wan a Ermenîstanê, li herêma Qersê Ev çend sal in Firîda Hecî dimîne, bi Cewarî ku li Erîvanê îmkânên amade sînorkirî îî bi hin tîpên pirtîik latînî hatiye kişandin (F. Arakskiy, kirine VZakavkaze, S.-Pêterburg, 1910) pêşkêşî xwendevanan kiriye.[5] Cara pêşîn di derbarê Heciyê Cindî de (1908-1990) bi navê Heciyê Cindî - Jîyan û Kar xebateke bîyografîk weşand.[6] Cewarî, ji aliyê din pirtûkeke Heciyê Firîda Hecî bi navê Cindî ya folklorê Folklorî Kurda amade kir îî dîsa li Rewanê derxist. Di vê xebata dawî de her wisa jî qasî 40 pêkenokên Mele Nesreddîn (Nesreddîn Xoce) cîh girtine ku cara pêşîn bi kurdî di vê pirtîikê de tên belav kirin. Heciyê Cindî herî ev berheman berî rairina xwe ji zarê gel berhev kirine.[7] Firîda Hecî Cewarî her wisa jî herî berhemen helbestvan Fêrîkê Êsiv (1934-1997) wek sê cildan amade kirin ii li Rewanê weşand. Fêrîkê Êsiv zêdetir wek helbestvan hatiye nasîn, lê belê her wisa jî şano, çîrok îî berhemen edebî yên mayîn nivîsîne îî berheraên hin nivîskarên cîhanê wergerandine kurdî.[8] Ji van sê cildan cildê yekem bi van rêzên helbestvan Fêrîkê Êsiv ve dest pê dîke: Mîna toxim direşînim pirsêd melûl ser kaxiz Wê pey minra guldin gelo, bigihîjin, bibinrez Yan hêsirê kesîserda wê nebarin wek baran, Êbêxweda wê birizin, pûçbin, herin bê deng û hes.... Wisa tê xuyan ked îî hewldayînen helbestvan di ro de, badUhewa 158 neçûye! Firîda Hecî Cewarî bi çapkirina van hersê cildên helbestên Fêrîkê Êsiv (tomerî 1000 rîpel) karekî gelek baş kiriye. Her wisa jî di derbarê vî helbestvanê kurd de gelek zaniyariyên kêrhatf di nav rûpelên van sê cildan de hene. Di van pirtûkan de çend kesên ku li ser nivîskariya Fêrîkê Êsiv hin tişt nivîsîne, wek rexne ii danasîn jî cîh girtine. Wek mînak Wezîrê Eşo îî Eskerê Boyîk li ser

helbestvaniya Fêrîkê Îsiv du nivîsên dirêj amade kirine. Ev herdu nivîsên baUcêş ii kêrhafî di cildê sêwera de cîh gktine. Firîda Hecî Cewarî di dawiya cildê sêwem de nîşan dide ku navê Fêrîkê Îsiv ii Fêrîk Egîd Polatbekov hatine tevlihev kirin, hin helbestên Fêrîkê Îsiv wek mînak bi şaşî îî xeleti, raixabin U ser Fêrîk Egîd Polatbekov hatine hesabandin.[9] Kal bavên Fêrîkê Îsiv, wek Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî ji gundê Yemençayirê ne.[10] Ev gunda yek ji wan gundên Dîgora îro ku li devera Qersê dimîne, tê hesabîn. Navê bavê Fêrîk, Îsivê îbo, navê kalkê wî îboyê Herao biîye. Ji êla Sîpka ne. Dema di sala 1918an de Qers dikeve destê tirkan^ kurdên êzdî dkevin, derbasî aliyê Ermenîstanê dibin. Şeş zarokên îboyê Herao hebiine: Hesên, Zozan, Çilê, Kidê, Xezal îî Îsiv. Ji wan du heb di şer de dumin, yên din Hesên, Çawa Kidê, û Îsiv U diçki Qersê Ermenîstanê Xezal dimîne. era dibînin Xezal, dayîka Riza ye, Rizayê ku piştî 60 salan ji seredanê. êrîş Qersê Dema tê Rewanê ji bo sala 1918an tkk Xezalê, bi wê kurdan dikin, raêrê yekî bi Koroxlî Hesênê Malbateke êzdiyên Qersê ku bi treneke alikariyêya emertkî koçberî Ermenîstanê dike. Ev sûreta cara pêşîn dikujin, navê re Ceraaldînî dizewice îî Xezal li Qersê diraîne. Ji wan Îsiv jî bavê helbestvan Fêrîk e. Ji ber vê yekê jî Fêrîk bi di kovara navdar National Geographic Magazine de hatiye weşandin (hejmar: November/1919) navê Fêrîkê Îsiv hatiye nasîn. Çawa tê zanîn lêkolêr îî nivîskar Heciyê Cindî jî ji vê raalbatê ye, kurê Zozanê ye. Di edebiyata kurdên Sovyetê de temaya Qersê hertim bala mm kişandiye. Romanên ku li Ermenîstanê hatine nivîsîn bi firehî qala kurdên Qersê dikin, wek romanên Erebe Şemo, Heciyê Cindî. Lê belê di hunera helbestvaniya kurdên Sovyet de Qers û kurdên Qersê 159 mijareke wisa xurt nîne. Di

kêm helbestan de em rastî vê temayê tên. Destana Rizayê Kurmet ku ji aliyê Fêrîkê Ûsiv hatiye nivîsîn ji ber vê yekê gelek gking e. Ev destan li ser wî kurdê Qersî, Riza ku di sala 1978an de hatiye Rewanê, tê gotin. Fêrîkê Ûsiv ev helbesta dirêj (13 rûpel) bi destan nav kiriye. Yek ji wan helbestên here balkêş, bi baweriya min ev berhem e. Fêrîk, ev helbest avitiye ser kunnetê xwe yê bi navê Riza ku di sala 1978an de ji Qersê hatiye Rewanê wekî nasên xwe bibîne. Riza, beUcî jî kesê yekem ku sînorê Sovyetê derbas bîye îî bi hesreta dîtina xal û xarziyên xwe hatiye Ermenîstana Sovyet. Ji der vê helbestê, her wisa jî Firîda Hecî Cewarî di naraeyekê de hin bkanînên xwe yên li pêşkêş dîke: "A'flvê gundê wî Qizilqule Z?w. [1 1] Navê xanima wî Gule bû, yeke ser vê hevdudîtin û rasthatina giring pirr bedew, xeberxweş bû. Digotin in. 3-4 zarokên me li îzmirê zewicîne, mêr kirine, dûri wan Gundê xwe de tenê kurdi xeber didin, lê diçine bajaran, wê demê tenê tirki xeber didin. Hema dema gîhiştin Yêrêvanê, telefonekji me re hat, paşê Fêrîk pêra axivi, piştra ez û Fêrîk şev rê ketin çûne hotela wan. Riza bi kiras û derpê ve derê oda xwe vekir, wî û Fêrîk hev hemêz Idrin, hev bersedidan. Hey yeki digo, birê min, hey yê din. Ez û Gulê jî iske-iska me bû li dora wan diçûn, dihatin. Pişt re rûniştin, îjar Fêrîk go ez kî me, îjar em çûne rûyên hev. Riza di derheqa xal û xatijaji me pirsî, Fêrîk got, ew çûne ax û barê sar, bû kuriniya wî giriya. Go ax, edê, ez dereng hatim ditina xwîşk û birên te, wax, wax.... Rizaji Fêrîkê re got, gidi, bextê te me, min zû bigihine gund, ez herim ser mezelê wan. Edî berbang bû, em hatin mala bavê min, li wir jî girivê şabûnê bûn. Fêrîk bi telefonê Hemoyê birê xwe re xeber da, gotin berf zef hatiye, lê emê hema îro bi avtomobîla Vilisê bîn. Hatin, edî nivro bû, bavê min nehişt wê rojê rêkevin,

sivetire pey taşte re rêketin. Berî çûyîna xwe ya Romê, Riza û Gulê dageriyan Yêrêvanê, mala bavê min man. Kurdên me ên nas û nenas dihatin ditina wan. Roja sisya em çûne hotelê, wekî Riza heq-hesavê hotele bide, piştira bi avtoyen lawikên gundê Pampê rêketinber bi bajarê Gumriyê, wekî ji wir bi tîrenê herine Qersê. Li Gumriyê, dema xatirê xwe ji hev dixwazin, Riza bi dilşewat dibêje: "Qurbana we bim, ezê dîsa bême dîtina we. De di wan salan de çûyin-hatin pirr çetin bû". [12] Destana Rizayê Kumiet ku helbestvanê kurdê Sovyeta kevn, Fêrîkê Êsiv di sala 1985an de nivisiye, helbestekî gelek bi dilşewat e 160 ku ser temaya sînor, hesret îî rairinê ye. Di vê helbestê de xanima kurd a bi navê Xezal destê kurê xwe digre, tê ser sînor, berê xwe dide Ermenîstanê, bi sînorparêzan re dipeyîve îî silavan xwîşk îî birayên xwe yên ku Ennenîstanê ne, dişîne: Xezalê mixiriyê daye du xwe Hatîye xamê Delî Qazî Ê deyl sînor\>an kiriye Dûr,>e Idriye hewar - gazî: "Ez Xezal im, êzdîya sîpkî Qîza îvo, xuşka Hesên, xuşka Êsiv Kevanîka Hesên Cemaldînî Sînorçî, ez bextê te me Tit ê cabekêji min re bînî Hesên sax e? Êsiv sax e? Kidê sax e? Gelo li wan dera dikin Pîrsa halê xweyînga xwe? " Ev zarokê ku dayîka wî bi destê wî digre, di vê helbestê de tê ser sînorê Tirkiye îî Ennenîstanê, ev Rizayê ku bi rastî di sala 1978an de hatiye Ermensîtanê bi xwe ye. Di beşeke vê destanê de çawa em dibînin Riza diçe goristana gundê Parapê, li wir gorên xal îî xatiyan zîyaret dike îî hinek xweliya ser gorê hildide wekî paşê bibe Qersê, bavêje ser gora diya xwe Xezalê, Xezala ku "Ax û kesr dilda mayr. . . Tevîxizm ûxûnavêgund, Xwey-xûnavê dereng hatî Diçepala çîyayê bilind Ser mezêlê xal û xatî. Ê ew mêrê musulmaniyê Dînê xweda zikirîzor Hiltîne bo xatirê xala Tasa Sultan Êzîdê sor. Çenge xweliya mezêlê wan Ê mezêlê Kida xatî,



Dike nava destmala al Bi tiberld, tulizmetî. Wekî bibe here wira Bireşîne bi şîn-şahî, 161 Ser mezêlê xuşka wane Ax û keser dilda mayl Bavê helbestvan, Êsiv, vê carê gazî kurê xwe Hemo dike û bi hevra berê xwe didin welatê kal û bavan, aliyê Dîgorê, xwîşka xwe Xezalê bi bîr tînin: "Kar-xezala quntara çîya" Hemo, lawo Êsiv dibê Mirin mayîn aliyê Xwedê Lêfi aliyê Qersê, Qulpê Dîgor şêne wek destê dê. Hergê Xwedê huneitnezin Nekirebepara gorê Ser-beratê xweyînga min Wê kivş bibe li Dîgorê. Helbestvan Fêrîkê Êsiv di davdya destana xwe de pêşnîyai-ekê jî, ji kurmetê xwe re tîne ii hêvî dike ku Riza, keçeke van kurdên êzdî li Ermenîstanê ji kurekî xwe re bixwaze: Tevî bira-beledêd xwe Bigere cî-warê xwestî, Ji bona ewledê xwe Nîşan bike qîzek êzdî... Di dawiya destanê de em dibînin ku Riza êdî ji Rewanê derbasî Qersê bûye. Çend sal şunda xebereke nebixêrê dighêje Rewanê û tê gotin ku Riza çîye dilovaniya xwe. Hira di dawiya destana bi navê Rizayê Kurmet, hira di naraeya Firîda Hecî Cewarî de em fêr dibin ku Riza ji ber nexweşîke gkan, wefat kiriye.[13] Careke din êdî riya wî berbi Rewanê nakeve. Lê belê şik û guraan li ser mirina wî di vê helbesta Fêrîkê Êsiv de her berdewam e: "Kî dizane..hesibandin çawa cesûs".[4] Him seredana Riza, him jî destana Rizayê Kurmet bi dîtina min ji her aU ve gelek balkêş e. Riza, belkî jî kesê yekem bûye ku di van salan de çîye Rewanê bona zarokên xal îî xatiya xwe dibîne. Ji aliyê dkokî de jî ev bîiyer, nûçeyeke balkêş îî hewaskar pêk tîne. Fêrîkê Êsiv di helbesteke xwe ya din bi navê Çîya-Banî de jî berê xwe dide Qersê yan jî berê şivan îsa dizvirîne wî alî: "Şivdar tûj kir aliyê Qersê". Çawa di vê helbestê de xuya dibe Qersa vî şivanî, ji Pampa helbestvan zêdetir şirîntir e (Parap: Ermenîstanê): ... 162 gundê Fêrîkê Êsiv li Wê derê bû, birê apo

Wekiland wî careke din Paşê hizing hatê û got "Şam şekire, weten şirîn". Ez şaşmayî ber xwe ketim Wekî dewsa Pampa bikir Apê Isa gundekî din Hesaw dikir "Şam û Şekir".[\S] Pampa ku li quntara çîyayê Qemerday dirâne, gundê helbestvan Fêrîkê Êsiv bîi. Wî, gelek salên xwe li wir derbas kir.[16] Li ser gimdê Pampê her wisa jî Wezîrê Eşo pirtûkek nivîsîye, ev cara pêşîn e ku gundekî kurd li Erraenîstanê dibe rajara pirtûkekê. [17] Fêrîkê Êsiv, gelek teraaya helbestên welatevînîyê xwe de di kiriye mijareke bingehîn. Di helbesta bi navê Kurdistan de welatê xwe yê ku bi salan jê dûrrayî wek "Dîya min dîr-derayf dinavîne îi dide ^:,,, --' -^ ^ XM Bergên hemû berhemên Fêrîkê Êsiv nasîn.[18] Di helbestên wî de era her wisa jî enînivîsa kurdên êzdî dixwînin, enînivîseke ku ji sirgînê, diirwelatiyê û koçberiyê pêk tê. Ew dilê xwe ji koçberan re, xerîb îi bêstaran re dike hêlîn: Qulingno, hey wax, hûn çûn Êwir nebûn vî meskenî Dilkê min we re hêlîn We nehat lê danenî.[\9] Ev rêzên bi dilşkestî her wisa dîsa serpêhatiya Rizayê Kurmet tîne bîra rae. Piştî mirina Riza, êdî tu deng îi behs ji aliyê Qersê nayên. Ev sînorê bedbîn bi salan hemî têkiliyên mirovan diqetîne. Bi kurtahî çawa era dibînin teraayên wek sînor, koçberî, rairin îi tunebîin li vî welatê Serhedê ketine zikê hev, gazî hev dikin. [1] Rohat Alakom, Kars Kiirtleri, Avesta, 2009, rûp.405-443. [2] Rohat Alakom, Mîsyonerên swêdî li Serhedê (1898-1921), Nefel (2/3 2008). [3] Dimitriy Pirbarî, Ezdîyên Serhedê (bi rûsî), Tiflîs-Moskova, 2008. [4] Berê 11 aliyê Eleşgirtê, li nehîya Ayintapê (întap) kurdên êzdî diman. Li devera Tutaxê re carina Ayintap digotin. Têkiliya vî navê kevn, bi navê wî bajarê mezin ê Tirkiyê, (Gazî)antepa îroyîn re qet tune ye. 163 [5] Firîda Hecî Cewarî, keça Heciyê Cindî û xanima helbestvan Fêrîkê Êsiv e. [6] Firîda Hecî Cewarî, Heciyê Cindî -

Jîyan û Kar, 2003, Yêrêvan (Çapa duwem, 2007). [7] Heciyê Cindî, Folklorê Kurda, 2009, Yêrêvan. Amadekar: Firîda Hecî Cewarî. [8] Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild 1 (2008), cild II (2008), cild III (2009), Yêrêvan. [9] Angorî Firîda Hecî Cewarî, ev tevlihevî di Antolojiya Edebiyata Kurdî ku ji aliyê Mehmed Uzun de di sala 2003an de weşyaye, cîh girtine. Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild III (2009), Yêrêvan, rûp.342. [10] Rohat Alakom, Rojek li gundê Heciyê Cindî Yemençayirê, Netkurd (22/9 2008). [11] Gundê Qizilqtilê, gundekî Dîgorê ye, ev gund her wisa jî gundê malbata Casimê Celîl tê nasîn. Berî sala 1918an gundekî kurdên êzdî bii. [12] Nameya Firîda Hecî Cewarî ya bi 12/1 1 2009 terîxî. [13] Di derbarê sala hatina Riza û sala wefatbîna wî de Firîda Hecî Cewarî wiha dibêje: "Min sala hatina Riza di cilda 1 ya Berevoka Berhema Fêrîkê Ûsiv de nivisiye 1979, lê belê serfotoya Riza de bavê min nivisiye wekî, Riza 1978an de hatiye Yêrêvanê, ev agahiya dawî rast e. Piştî çend mehan, ez divê payîza ya sala 1980 an doxtirekî tirk ser kaxezekî morkiri nivisi bû, weki Riza wefat kiriye" (Nameya Firîda Hecî Cewarî ya bi 12/1 1 2009 terîxî). [14] Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild III, 2009, rûp.84. [15] Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild II, 2008, rûp.225. [16] Fêrîkê Ûsiv, Pampa Min, Yêrêvan, 2009. Di vê berevokê de hin helbestên Fêrîkê Ûsiv cîh girtine. Berevok ji bo zarokan hatiye amade kirin. [17] Wezîrê Eşo, Pamp-Sîpan, hene: 1986, Yêrêvan. Angorî Wezîrê Eşo, du Pamp Di dema Pampa Kurdî (Kirdî Pamp) û Pampa Ermenî (Hayî Pamp). Sovyetê de navê Pampê kirine "Sîpan". Angorî Wezîrê Eşo, gotina Pamp ji navê çemekî tê. [18] Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild III, 2009, rûp.158. [19] Fêrîkê Ûsiv, Berevoka Berhema, cild III, 2009, rûp.154. PERWIZ CIHANI MÎRÊ HOZANAN

FÊRÎKÊ ÛSIV Herçend ku heval û hogirên Fêrîkê Ûsiv yên şîrhelal hêjayan: Wezîrê Eşo, Eskerê Boyîk, Çerkezê Reş îî zindebk Şakiroyê Miho û yên raayîn li bara berhera û jîyan û xiî û xideyên Fêrîkê Ûsiv da bi hûrgilî nivîsîne îî li wê barê da tişteki ji dîtir nivîskar ii vekoleran ra nehîştine, îî çendîn gotar U ser wî îî berheraên wî nivîsîne, lê rauxabin 164 dîsan jî wisan ku pêdivî be, rae Kurdan Fêrîkê Ûsiv baş nas nekirîye. Fêrîkê Ûsiv herçend ku li nava kurdên Elegezê bi taybefî ii U nava kurdên Sovêtistana berê da bi giştî, hozanekî naskirî û hezkkî biiye, lê rewşa welatê rae yê dagîrbîyî îî bindestiya gel, bûne hegera wê hmdê, ku ew helbestvanê hêja ii bîrhingêv îî xeberxweş îî durmas li pişt perdeya sînoran da dîir ji agahîya pişka zore gelê xwe li tarîfî, xerîbî îî bêdengiyê da biraîne. Lê di gel wê hindê dîsan jî gava ku mkov helbestên wî dixîine îî wan durr û gewherên nayab bi çav dibîne, rakov raat îî zendegirtî dirraîne, ii ji xwe dipirse; gelo çuna evî helbestvanî li cîhanê da deng venedaye. Dibe ku ji bilî bindestiya gel û dagkbîina welatê wî hindek ho îî hegerên dî yên vê bêdengiyê jî hebin. Bi dîtina min yek ji hegerên sereke ku nehîştîye Fêrîk hindî zanîn û karîna xwe, hindî pileya helbestên xwe bête nasîn û nasandinê, ew bûye, ku Fêrîk hozanekî rastbêj îî durustgo bûye. Ew rairovekî devdoşab, zunanliis ii raisder nebîye. Ew ne xoşxwanê hêza serdest û desthelt biiye. Bi gotina wî bixwe ewî durra helbestên xwe wekî hestiyar navîtiye ber seyên dir, lema ew wisan nenaskirî îî bêdeng maye: Mêrxasîya te heqiyê Ku te şîera xwe durr Nekir hestûyê destpiyê Kelbêd xayîn û dirr Fêrîk li vê helbestê da nîşan dide ku raêranîya helbestvan ewe ku helbesta xwe ya wekî durr îî gewheran, neke hestiyên li nav des ii pîyên seyên dirr ii har da. Mebesta wî ji seyên dirr îî har, hêza serdest û zorbêj û zordan e.

Tenê ev benda helbesta wî têra wê hindê heye, ku desthilatdar ewî li bêdengî û nenasînê da ragre û li nav sînoren xwe da qelebend bike îî sansorê dane ser. Lê tav herdem li pişt ewran da naraîne. Rojekê bê ku tava wêjeyê, ewrên reş û tarî yên sansorê biçirrîne ii tîrêjên xwe pêşkêşî mirovanîyê bike. Ezê li vê gotarê da têbikoşim ku bi berçavka toreyî li çend helbestên Fêrîkê Ûsiv mêze kim ii wana angorî zanîn ii karîn ii pêşîyana xwe hilsengînira îî binirxînira. Ez dibêjim ezê li çend helbestên vvî mêze bikim, lewra ku şiroveya hemû berhera û şînewarên wî karê mkovekî tenê nîne îî pêdivî bi civatek ji lêvekol, wêjenas, zimanzan, torevan, peyvnas, rewannas, civaknas û bi kurfî dumasên mkovanîyê yên pispore heye, da ku bi mehan li ser berheraên wî bixebitin û wan dun- û 165 gewherên bîr û hizrên hozanê rae yî gorrbihîşt, hozanê xerîbiyê, durra li dest nezanan ji xwendevanên kurdî ra şirove bikin. Ez li ser wê bawerêrae; her kesê ku bixwaze li gel zarave, tore, urf, edet, rê û rism, rabîin îî riîniştin îî jîyana kurdên me yên Sovyêtistana berê nasîyar bibe, debê ku berhera îî şûnewarên Fêrîkê Ûsiv bixîine îî bi rêka wan Kurdên me yên Qafqaziyayê bi başî binase. Lew ra ku Fêrîk li ser gelek tiştan nivîsiye. Ew siwarê qelema xwe ya serkêş lê rewanro û aza bîiye û li hemîi waran geryaye îî ji her kanîyek ji kaniyên wan waran mistek ava helal û zelal vexwariye îî serî li hemîi qunc ii kuj ii rexên deb îî resm îî urf îî edetên gel daye îî bi tûrkê dagirtî li kaxezê zivirriye. Fêrîk li ser evîne, li ser şîn îî girîne, li ser reşgirêdanê, li ser jinê, li ser şivanî, berxvanî, rênçberî, gundîfî, koçerfî îî kurdîtiyê îî bi gişfî H ser heraii kar ii barên jîna rojane ya kurdewarî, helbestên balkêş nivîsiye. Bêhna gundîti, koçerti îî kurdîtiyê ji tek tekê helbestên wî tê. Mirov bi xwendina helbestên wî ra agadar dibe, ku du tişt li jîyana

wî da pirr giringin; evîn îî nivîsîn. Lê ew berê evîndare, paşê hozan û nivîskar. Ew vêzarê bajar îî sîikan, evîndarê simşt îî keç îî bîikan, bengiyê çil îî çîyan, sewdaserê deşt îî banîyan, tihniyê avêd kanîyan, hijmekarê gelî îî geboz îî zozan ii berkozên welatê xwe ye. Eger maraosta Hêmin Mukuriyanî bêje: "Aşiqî çavî kejal û gerdenî pirrxal im Aşiqîkêv û telan û benden û berdim emin" Lê Fêrîkê Ûsiv hen evîndarê çavbelke îî bisk xelekane, hem jî evîndarê çil îî çîya ii gedûk îî mêrg îî çîraenên kesk îî şîn îî çîyayên serkevere welatê xwe ye. Ez li vê barê da niraîneyan nahînira. Dîwanên helbestên wî gowayên vê gotinê ne. Fêrîk U evîna xwe da rastbêj îî dumstkare. Ne xwe dixapîne îî ne hevalê xwe dilêpîne. Ew li evînê da bêbak û bêperwa ye û ji kesî natirdse îî ji kevmeşopan napirse û evîndariya xwe bi aşkerefî radigehîne û heylo naziktirîn sk û razên xwe yên taybefî û kesinîyê jî ji xwendevanên helbestên xwe ra servedike. Eve pileya here bilinde çalakî ii bêbakîyê ye. Fêrîkê Ûsiv hozanekî netirs ii bêbak û bêperwa û xeberxoş û zarşirîn û qisezan e. Ew hind serbeste, her çî ya ku dilê wî dixwaze dibêje. Ew derewan ne li dilê xwe, ne jî li xwendevanên helbestên xwe dike. Ew li rastbêjîyê da taiaşa xwe ji felekê jî nagre. Ew li çi dera û cîyan da xwe sansor nake. Fêrîk baş zanîye, ku xwesansorî belayek mezin e ji helbestvan û nivîskaran ra. Lewra eger nivîskar, yan hozanek U ber ho îî 166 hegerên civakî, ramiyarî, dînî, yan her hegerek dî xwe sansor bike, êdî nikare ya dilê xwe bêje. Êdî nikare bi dilê xwe ra bi rastî û dumstî bijî. Xwesansorî mezintirîn aşîte ku U ser hest îî nestên hozan îî nivîskaran da tê, lê xweşbextane ew aşîta reş U ser Fêrîk da hehatfye. Helbestên wî hemî jî xweşik îî nazik û rindik îî ruhsivk in. Ji biU bedewî, xweşikî ii rewanî îî şêweya taybete raçinîna van helbestan, hebîina bi sedan peyvên

kurmancî yê resen, bi sedan peyvên ku U hîç ferhengê kurdî da nehatine berev kirinê jî, serratfyeke dî didin helbestên Fêrîk. Yek ji erkên sereke yê nivîskar î hozanan parastina peyvên resen î afkandina peyv î hevbend î biwêjên nî li gorekî rêziman î rîşalnasîya zimanî ye. Fêrîk U vî warî da jî gavên pkr bUind havîtime: Pîgar, nîvekar, zevzevk, xiinkeUc, talaş, pejal, xêv, xirkigêlê, genefis, dilhavêj, dinêdîir, rûrij. . . û bi dehan peyvên dî. Eger mirov bi pîvaneya helbestnasîyê li helbestên wî raêze bike, mirov dibîne ku pişka zor ji helbestên wî li bara qalib, wate forra î wêneya helbestê da mesnewî, çarpape\* î hindek jî bi şeweya serbest hatine vehiinanê. Li çarpape î mesnewîyan da ew pirr caran kêş û paşbendan raçav dUce ii diparêze, lê hindek caran serbesfîyê dide wan î wana bêy kêş î paşbend raberî xwendevanan dike. Paşbend wate qafîyeyên helbestên wî hemî jî xomalîne î diwekin paşbend û hevhanîna istiran î kilaraên kurdî. Fêrîkê Ûsiv helqe û pira nîveka helbestvanên kUasîk û yê nîijen e. Helbestên wî bi qalib î wêneyên xwe yê riîveyî bi tevraa xwe va kilasîk, lê li hîinan î badan, rîstin î vehîstin, raçinîn û daçinîn, rahîştîm î dahîştîki, û lêlkm û nexş î nîgar î nitkandinê da, li ziman î wênesazî î cuwankarîyên toreyî da nî ne. Min bihîstiye ku dengê wî pirr bi şewat bîye, lê ez nizanim gelo Fêrîk wênekêş jî bûye, yan na. Lê ew li wênesazîyên toreyî da bi rasfî wênekêşekî qenah û kara ii şîya ye. Ew li helbestên xwe da wisan pesna suruştê dide, wisan rewşa suruştê dinitirîne î şirove dike, mirov dibêje qey, hema rasti mkov helbestekê naxûne, belkû tabloyek wênekêşkirî mêze dUce î bi çav dibîne. Lê hkidek caran Fêrîk ji wê jî zêdetir diçe î tablo na, lê fîlmekê raberî xwendevanên helbestên xwe dUce. Ev çêşîtên helbestên wî bi rasfî jî zindîne. Mirov xwe di nav

wan da dibîne. Me hemûyê gelek caran qulibîna tavê dîtîye, lê qulibma tavê li derîçe ya çavên Fêrîkê Ûsiv da bi currekî dî ye. Ew ewê bi currekî dî dibîne. Kerem km evê helbesta Fêrîk mêze bikin:

167 Esrê mînanî dayîka dergûş Şemsê nûr daye milê xwe diçe  
Tevna kerasîyê hêşîne hermûş Sînore çiyêva berjêr radiçe. Ba difîfîne qaydekî yekhang Nêktara gula dalêse nevsek Tîrinca royê kirîye doUdank Xwe tê da dikilê çivîka zevzevk. . . Em U van herdu bendên helbesta Fêrîk da çendîn tabloyên zindî dibmin. Em pêş da danê berîêvarê wekandîye dayîkekê îi tav jî wekandîye zarokek xweşik îi nîkanî ku "esrê" ew daye milê xwe îi diçe. Peyva herî balkêş li vê wênesazî yê da, peyva çiyîin e. Li vê peyvê da hejîyan îi livîyan ii canpêdanek heye îi mirov bi çiyîina wê dayîkê ra bi çuyîna dem îi gavan îi danê rojê agadar dibe. Evê çuyînê kesayetîpêdan a (personification) helbestê tekûz kirîye. Ji biU wê hindê peyva "Şems", pîrozîyên dîne Êzdîtîyê jî tîne hişê mkov îi mkov agadar dibe, ku Hozan xudanê bîr îi bawerîyek taybet e. Li dîi çuyîna esrê wate berîêvarê, îi berebere avabîna rojê ra sî dadigerre ii ew sî pêş da li bmtar îi qontarên çiyân ra dest pê dibe û hindî ku tav ber bi ava diçe, ew sî jî berebere dirêjtir dibe îi berjêr tê. Lê Fêrîk nabêje sî ber bi jêr dirêj bîi. Ew wê berjêrbûna sîyê ra dibêje berjêr radiçe îi bi peyva raçinîne raçandina tewna wê malura hermîiş tekûz dike. Bi gotinek dî hozanê me, ewê sî îi kerasîya berî êvarê diwekîne tewnek armîişê şîn, ku ew tewna ji sînore çiya berebere ber bi jêr tê raçandinê. Li benda duyem da, ewî givîna bayê wekandîye fîtîna mirovekî demsaz îi bêxem ku bi yek ahengê istiranekê dibêje, yan awazekî difîtîne îi bi nefsekî îi dilbijokî şîre îi eşqera gulan dialêse. Li dîi ra ew tkêja tavê diwekîne hêziink û dolîdankekê îi fimna cûcîkekê ku bi çiveçiv li ber tîrêjên tavê



serraestane li hewa ba dibe jî, diwekêne wê hindê ku çivUc xwe U hêlikana tîrêjên tavê da dikilê. Ew li helbesta payîza dereng da weha can dide bisfî îî çopên gul îî kerengan yên behî îî hişkbiiyî: Heyamek heye, payîza dereng Beta vedibin kulîlk û kereng Dewse çend çopê gewre qudûmsist Guhê hevdu da dikin pistepist 168 Nizam derheqa bayê harî dîn, Wekî talan kir rewşa wan rengîn Yanê derheqa wê mija nêzîk, wekî serê çiyê lev dihe gizîk. Li vê helbestê da çawa ku rain li jorê nivîsî, hozan ruh îî can dide bistî îî çopên gul îî kerengan yên hişk ii hola. Ew hej îî liva wan bistîyên hişk li ber bayê îî dengê hejîyana wan diwekîne pistepista rairovan. Mirovên ku li tirs zordar û serdest û dagîrkeran nUtare eşkere îî bi dengê bilind biaxive, lê derdê dilê xwe dizîva îî bi pistepist U guhê heval îî hevderdê xwe da dibêje. Ew givegiva bayê sar û har diwekîne nimna zaliraekî zordarî tajank li dest, îî bistîyên reqe riît jî diwekîne bîndest îî tepeserên dagîrbiiyî û riît ii tiit bê berg îî bê kiras, ku reng îî berg û kkasên wan, xweşî û geşî îî şênî îî şayî îî serbestîya wan ji layê wî dagîrkerî va hafîye talan kirinê. Ew mija ku tê çiyê jî dagîr dike, leşkerekî dagîrkere ku li war îî welatê gul û sosina hewilîye îî li ser serê çiyê bîiye gizîk îî li çiyê alîyaye. Di vê helbestê da çend tiştên balkêş hene. Yek ewe ku çend kesên bêdesthelat ku rewşa wan ya rengîn hatîye talan kimê û railk û raal îî war îî welatê wan hatîye dagîrkinê, lê li ser da jî evên zorlêbûyî li tirs zordarên dagîrker da nikarin dengê xwe bilind bikin îî pênexoşîya xwe li dijî wan dagîrkeran ragehînin, belkû ji ber zordarî û çavsorîya dagîrkeran dizîva îî bi tirs îî lerz li guhên hevdu da dikin pistepist. Bi şiroveya vê helbestê rewşa Kurdistana dagîrbiiyî ii kurdên bîndest îî bêdesthelat îî tepeser, km-dên ku rewşa wan ya rengîn hatîye talankirinê û ji tirs zordarên dagîrkeran nikarin

biaxivin jî, tê ber çavê mirovî. Ew li helbesta xwe ya bi navê Çîya banî da, hunera xwe ya wênenigarî (îmaj) î kesayetîpêdanê (personification) digehîne radeyek pk bilind. Ji wan hemû tabloyên rengareng ii fîlmana ezê tenê bendekê wek nimiine bînim: Gêdûka wekpišta devê Xanê dikir ter û temîz Daketibû ser neqevê Şiverya gewr mîna werîs Fêrîk li vê helbestê da gêdîika çîya wekandîye pišta hêştirekî î 169 şiverêya gewr ku li neqeba çîyê ra derbas dibe jî wekandîye werîsekî ku barê hêştirê pê hatîye şidandin ii li ser newqa hêştirê ra derbas dibe. Peyva neqev hera neqeva çîyê î hera jî newqa devê tîne hişê mirovî. Gava ku mirov helbestên Fêrîk dixîine, mirov dibîne ku Fêrîk ne tenê li rêka xwendin î nasîyarîya toreya cîhanî da bûye somekarê derîyaya toreyê, belkî helbestvanî li zatê wî da, li nav gîyanê wî da pêra hatîye cîhanê î li nav hiş î hedamê wî da perrvedaye. Helbestên wî wekî ereb dibêjin: "sehl î mumteni" in. Wate li riîva mirov we seh dike, ku sade î sakarm î mirov dUcare wekî wan biafkîne, lê gava ku yek bixwaze helbestek wisan binivîse, yan yê nikaribe, yan jî yê gelek zehmetîyan bikişîne. Helbesta wî ya bi navê ser mezelê dîya min jî yek ji helbestên wî yên balkêşin. Hozan diçe ser mezarê dîya xwe î dibîne, ku gulek xweşik li ser gorinê hêşîn biiye. Bi dîtina wê gulê helbestekê dinivîse î dibêje dUê dîya min hind germ î nazik biî, ku ewî dilî du gul pêşkêşî civatê kirin, yek gula U ser gorina wê, yek jî ez ku gula civata xweme. Yek ji hunerên Fêrîk rewanbêjî û rewannivîsî ye. Ew wek hozanekî payebilind î pispor, bi hostatîyek tam, lê wisan sade î sakar ii rewan dinivîse, ku hem gundîyekî nexwendewar û bêsewad î hem jî akademisyenekî helbestevîn ziraanê gundîyê xwe, bi lezzetê ji helbestên zimanê şivan î wî dibînin. û Ew bi ji gavan rêncberan akademîsyenan ra dinivîse.

Hindek caran ew ji mijarek sade îî bêwate cîhanek pirr ji felsefe û pirs ii pksîyaran diafrîne. Me heraiîyan li jîyana xwe da, bi taybetî li jîyana gundîyên Kurdistanê da dîtîye, ku kalemêrên gund li ber dîwaran riidinên îî ji hev ra xeber didin. Fêrîkê Ûsiv ji vê riiniştin îî axiftinê helbestek weha felsefî diafirîne: Kala ber dîwêr, serêd xweye sîs Dane ber rema teva derengî, Dadigerrînin rojêdxwe ezîz Bi şinga şinga tizbîyê rengrengî Çiqas bedewî şîrinî dinya Dixwezim bijîm hetanî hetê Eşqê te bi istiran dişxulim dinya Û emrê min usa ser hevdu da tê. Fêrîkê Ûsiv sumştê û bedewetîya wê baş nas dike. Ew bi dîkbînî îî kûrbînîyek hozanane li hemû tiştî dinUiêre îî bêtune îî sade li ber çi 170 tiştî ra derbas nabe. Ew dengê ku rairovekî sade nabihê, ew dibihê, ew rengê ku mirovên asayî nabînin, ew dibîne. Dîraenek ku li ber çavên mirovekî sade, asayî ye, ji hiş û hedara û hest ii mejîyê Fêrîk ra dibe rajarek toreyî ye pirr giring û bilind. Fêrîk hozanekî gelêrî, nîştimanperwer, mirovevîn, sumştparêz îî têgiheştî ye. Herçend ku Fêrîk li Erraenistanê da jîyaye ii bi ferraî ii dîwanî Erraenistan welatê wî ye, lê ew herdem hesta xerîbî îî diirwelatîyê dike. Mirov vê hesta dîirwelatîyê li tek tekî helbestên wî da dibîne. Ew hind li hesreta welatê kal îî bavan da, li hesreta dîtina Kurdistanê da ye, ku nalînê wî dilê kevir ii kuçikan jî diavîne. Dîtina Kurdistanê ji wî ra dibe kul îî kederek mezin. Ew dizane ku ji wî ra li hev nayê ku here Kurdistanê îî welatê xwe dûr ji destê qilêrîne dagîrkeran û dik ji hêza xofiroşan zîyaret bike, lê dibêjî qey niqitîye dilê wî ku kurrê wî Zoro yê li dewsa wî da herre Kurdistanê. Lewra ew binê pîyên kurrê xwe ku dê paşê herre Kurdistanê îî li axa Kurdistanê bikeve, raaç dike. Eva pileya here bilinde xwezîk û hesretê ye, ku ji kîiranîya dilekî birîn û evîndar derdikeve. Fêrîk li dijî hemû sînoran

e. Li dijî sînorên destkir e. sînorên ku welatê wî perçeperçeyî kirine. Sînorên ku destên çîya îî zozanên welatê wî ji hev qetadine. Lê ew sînorên ku dîn, raesev, civak îî kewneşopan li nav rairovan da afirandine, ji sînorên dewlet îî hukîmetan xerabtir dibîne. Fêrîk netenê sumşvan û axarparêz ii welatevîne. Ne tenê haya wî ji mafe mirovan, belkî haya wî ji mafê lawir îî hemî gîyanliberan heye îî dijî rakovên heywanxor derdikeve. Dema ku kelokek li rex varik ii mkîşkan perrên xwe yê sipî çU li hev dide û bang dide, bangdana wî hestek hozanane û taybefî li dilê Fêrîk da diafirîne ii Fêrîk weha dibêje: Ax çi şerm e, çi eyb Em bê xofû bê xem Van ruhberê rindik Dikujin û dixwen... Li helbestek dî da, ew li dijî jinka ku tirranên xwe bi mêrê xwe dike, ku nikare pezekî serjê ke, weha dinivîse: Jinka dawdêre Qerfa mêr dike Ku mêr nawêre Pêz şerjê bike 171 // kufem bike Jinka dawdêre Ku bi rema xwe Mêr hema mêre. Fêrîk ne tenê helbestvanekî dilnazik îî hestiyare, ew dûrhingêv îî paşerojbîn e jî. Tu dibêjî qey niqitîye dilê wî dê rojekê bînanî roja îro, çawa li Kurdistana jêrîn, çîyayên Kurdistanê dê bêy şivan îî kurraanc ii kerî bimîne. Ew dibêje hînga çawa pismamekî min bimre, ezê rîinêra îî li ser çîyayê bê kurmanc îî kerî bigirîm: Bigerrim ezê ser kanîya Çîyayê bê kurmanc û kerî Û bigrîm ser van çtya bantya Çawa ser pismamêd mirî. Fêrîk jî bînanî Xanî pê hesîyaye ku kes qedrê qelema wî nizane îî wekî Xanî dinale ii lê ne bi zimanê Xanî belkîi bi zimanê gundî yê welatê xwe weha dibêje: Ax çi şerme, çi êş : Êl û alema te, Nagre qasî qurêş Qedrê qelema te. Fêrîk ne tenê hozan, belkîi ew wergêr îî folklorzanekî qerrah e jî. Dema ku mirov wergerrên wî dixîine, heta rairov li serdêr îî bindêrên nivîsaran nenêrre, rairov nizane ku ew nivîsara ji ziraanekî dî hatîye wergerrandinê. Dîna xwe bidenê ka çawa ruhê

kurdîniyê kirîye ber vê helbesta ney kurdî da : Ber bera şîn hebû malek Wir da diman ptr û kalek Kalê berê masî digirt Fîrê mal da teşî dirist. . . Ji bifî wergrrandina toreya bîhanî, Fêrîk çendîn çîrok îî efsaneyên kurdî jî vejandîye. Yek ji wan xewna Mirmih şahkarek ji toreya gelîrîye, ku Fêrkî bi hostatî bi peyvên resen û nexş îî nîgarên hozanane ew nîjen kirîye. Di wê efsaneya balkêş da Fêrîk bi hostatîyek tam ew wisan vejandîye ku xwendevan xwe li nîveka du cîhanên kewin ii teze da dibîne. Peyv û xemUandin îî nitkandin nîi ne, lê dîsan jî bêhna 172 toreya zarkî ji wê difurre. Ew efsane weha dest pê dibe: Mîrmih rabû bsr mirinê Û bû terkeserî dinê Go „Ez herrim wî welati Mirin tobe û lê qatî... Herçend ku helbestên Fêrîk pir xweş û dilkeşin, lê hindek peyvên işkestî îî neresen jî wekî bijarê (alaxê) xwe avîtine nav baxçê helbestên wî. Peyvên wekî: qend îî bend, li cîhê qeyd îî bend da, îsaf li cîhê însaf, îsanet li cîhê însanîyet, hevsûd li cîhê hesûd, heqmaq li cîhê ehmeq îî gelekên dî. Lê çawa ku min li jorê jî nivîsî, Fêrîk bi zimanê gundîyê xwe, bi ziraanê şivan îî gavan îî rênçberên welatê xwe dinivîse. Ev peyvên ku rain niraiine anîn gundîyên wî herwisan wan peyvana bi kar dibin ii ew hinda ji karên Fêrîk ra qet nabin kêraasî. Bi gişfî jî çawa ku Fêrîk ji Eskerê Boyîk ra gofîye, hema rasfî jî ewî baxçeyekî wisan rengareng çandîye, ku çî şexte îî ba û bagerên rojgarê nikarin gul îî sosin û nêrgiz ii beybiinên wî baxçeyî biçilraisînin. Ta kurdek tenê jî li ser riiyê vê cîhanê hebe, Fêrîk jî dê her hebe. \* Çarpare curek ji helbestane ku Ji çar nîvmalkan pêk tê. Ew li rûva wekî çarîneyanin, lê li bara kêş ûpaşhendê da wekî çarîneyan nîne. Ji bilî wê hindê ku kêşa çarîneyan û ya çarpareyan ne wekî hevin, paşbendên wan jî bînanî hev nînin. Li çarîneyan da nîvmalkên yek, du, û çar debê bêgotin li hev bînen û nîvmalka sêyem da hozan serbeste, ku ewêjî li

hersê nîvmalkê dî U hev bîne, yan na. Lê li çarpareyan da  
 nîvmalkên yekem û sêyem U hev tên û nîvmalkên duyem û  
 çaremjî debê li hev werin. Çarîne = 1, 2, 4 li hev tên, 3 serbeste.  
 Çarpare == 1, 3 U hev tên, 2 û 4Jî U hev. BAJARÊ ZCRICHÊ  
 AVESTA,s. 2009 173 NAVEROK Wezîrê Eşo - Pêşgotin Salên 20-î  
 yên sedsala 20-î Salên30-î Salên40-î 5 11 14 27 Derheqa Cerdoyê  
 Gêncoda Xezal Pêla duda Salên50-î 32 36 39 40 Bal îsahakyan  
 Salên60-î 41 45 Salên70-î Salên80-î HatinaRiza 48 50 50 "Tu bi van  
 çîroka ebîira xwe dikî?" Sa!ên90-î 54 57 Hecîyê Cindî hatiye  
 rewakirinê Salal998-a 58 59 Sala 2008 ya 100 saliya ji dayîkbiiyîna  
 Hecîyê Cindî Sêsiya zaniyariyê U Yêrêvanê 59 Civîna Enstîtuya  
 kurdî ya Parîsê Ez çîbûrae Kurdistanê 60 60 Konfêrans li ser  
 Hecîyê Cmdî (Duhok) 65 Bi raînesebeta 100 saliya Hecîyê Cindî ev  
 pirtîik hatine weşandinê . 67 Gotarên ku bi mûnesebeta 100 saliyê  
 çapiibne (bi kurtebirî) Vasîlyêva, Mîîsaêlyan - Bona bîranîna  
 zanyarê kurdyêmezin 68 N. Hovhanîsyan -Meznayê kurdzaniyê 69  
 S. Harûtyûnyan- Emekdarê zargotina kurdayî mezin W. Eşo-  
 Mezinayê xudanê keda mezin Dotên Hecîyê Cindî 70 70 Doktor  
 Firîca Hecî Cewarî Firîda Hecî Cewarî Zîna Hecî Cewarî 174 72 75  
 95 Doktor Nîka Hecî Cewarî derheqa xweda NazaHecî Cewarî 96  
 103 Eskerê Boyîk- Pîreka Hecîyê Cindî çîi ser dilovaniya xwe  
 Derheqa Çerkezê Reşda 104 105 Wezîrê Eşo - Çend nêrîn û bîranîn  
 ser Hecîyê Cindî H. Cindî raereraê jiyana xwe di nava xizraetkirina  
 himberî çanda kurdî da didît Ez biîm riiniştevanê Yêrêvanê 110  
 113 H. Cindî govend dida amadekkinê bona sivikkirina 116 gkaniya  
 hisreta dilê xwe "Gava te hildaye lêve , ezzanim çi U dêve"  
 Ronakbîrên kurd yên nifşa duyemîn 117 120 H. Cindî alîkar îî  
 şîretkarê nivîskar îî zaniyarên erraenî îî kurd H. Cindî wek oratorekî

(peyîvkirekî) naskirî 122 127 H. Cindî beşekî zanînên xwe ji aqilbendiya gelê xwe hilda H. Cindî piştî mkina hogkên xwe yên pêniisê xwedî li mirata wan ya berhemdariyê derdiket, ew dida weşandinê 130 132 Mirazê Êzo Cefarov - Pirtîk derheqa kurdzanê Mezin Kawa Nemir- Heciyê Cindiyekî nemir 134 137 Bîranînên min derheqa Fêrîkê Êsivda Kilama "Çiyano" Rohat Alakom -Destana "Rizayê kurmef '. 140 155 Enînivîsa Ezdîyên Qersê 156 Perwîz Cîhanî-Mîrê hozananFêrîkê Êsiv 164 175 FIRÎDA HECÎ CEWARÎ, BIRANINEN MIN Pirtîk amade kir, kompîitorêda berev kir FIRÎDA HECI CEWARÎ E-mail: info@timush.am

\*\*

## BIRÎNA REŞ

BERHEMEN MUSA ANTER 3

WEŞANEN AVESTA: 56

Berhemtn Musa Antr: 3

Biftna Re;

Editör Abdullah Keskin

Berg: Ahmet Naci Fırat

Tiprezt 0 Mizanpaj: Avesta

Çapa Yekem: 1965

Çapa Duwem: 1991

Çapa Seyem: 1999, Stenbol

Çap: Gûlen Ofset

Hejman Du hezar

© Avesta Yayınlan, 1999

Ji xeynf danasInJ beyi destura wesanxanê

bi tu awayl nayâ koplkirin

AVESTA BASİN YAYIN

REKLAM TANITIM MÛZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.

Aşmalı Mescit Sokak

Şahin Han 35/403

Beyoğlu / istanbul

Tel-Faks: (0212) 251 71 39

SOBE

İstasyon Caddesi, K. İsmail Pasa 2. Sokak

Abdi Pasa Apt. Giriş Katı

OFİS /DİYARBAKIR

Tel-Fax: (0412) 222 64 91

ISBN: 975-7112-65-8

Musa Anter

Birîna Reş

avesta

MUSA ANTER: Di sala 1918'an de H gûndeki li ser Nisebîne, Zivinge hatiye

dinyaye. Li Unîversîta StenboU Faqulta Hiquqe xwendiyê. Di sala 1959'an de ji Doza 49'an û di salen 70'yt de jî ji Doza DDKO bite girtin. Gava

derba leşkerî a 2Tê Gulane" pek hat Musa Anter di bin çavan de bû. Pis-

ti derben leşkerî 1 12'e Adart û 12'6 îlone jî hate girtin. Nivtsen wî di Dicle

Kaynağı, Şark Postası, İleri Yurt, Bans Dûnyası, Deng, Yeni Ülke, Welat,

Rojname, Rewşen û Tewlo de hatin weşandin, niviskare rojname Özgûr



Gûndem bû. Bi Tirkî kiteben wt y6n bi nave "Hatıralanm",  
"Vakayiname",

"Fırat Marmara'ya Akar", bi kurdt jî "Çınara Min", "Birlna Reş"  
A"Kımıl"

(Kurdt-Tirki) hene. Anter, di girtlgehe de ferhengeke bi Kurdt ji  
amade kiribû.

Avakare HEF6 bû û serokatiya Enstttuya Kûrdi a Stenbole dikir.

Musa Anter, di 20'ê Ilona 1992'an de li Diyarbekre hate qetilkirin.

HezSn

dewlete cenazeye wl bi tene ji Diyarbekre birin Sûitle Ê leşkeran ew  
vesait,

nehiştin ku kes here ser cenaze.

Avesta hemû mafe wesana berhemen Musa Anter wergirtiye. Pişti  
\vesandina

kitSbfin wl, wS albûmek be amadekirin. Kesen ku fotografek an jt  
dokumantek

Musa Anter li ba wan heye, em hevi dikin ku kopyake wê ji me re  
biştin. Ji bo fotoğraf pgwist e dema hatiye kisandin, e ku kişandiye  
an jî e

ku ji arşiva / albûma wî hatiye girtin û kesin di wêre de bene  
nivtsandin. Ji

bo alîkariya we, ji niha ve spas... |

DERMANFIN BIRÎNA REŞ Ê MUSA ANTER

"BirînaRcş", piyesa Musa Anter di sala 1965'ân de weşiya:Di rûpela  
duviemin ya kitebi de nivîskar dibeje: " Min ev pirtûk sala 1.965,  
li Stenbole li Harbiye, di hucrd38'an de wexte ku ez girtibûm  
nivîsîbû..."

Em wah salan bînin bira xwe; serhildanen Kurdan (1 925, 28, 30,

36, 38, 41, 42...) bi xwîn hatibûn şikestin. Gele Kurd car bi car aeti bûbû. Mij û dumana şewale ji welet radibû. Tîrs, xofû sav/i kirase xwe rakîşandibû ser welit. Bi sedan bi hezaran bîrewer, renas û ronahbiren

Kurd hatibûn kuştih, ji welet hatibûn bidûncistin û denge wan hatibû birin. Zimane Kûrdi û her tişte ku tekiliya wî bi Kûrdi û Kûrditiyt hebû hatibû qedexekiriri. Gele Kurd şîrta xwe giredabû. Welate xirbe û kavil digiriya. Neçarî, belengaziû begaviye nefes li insanin Kurd çikandibû.

Di rewşeke wikakambax de, gotina "ez Kurd im" bi sere xwe gaveke mezin bû... Musa Anter Birîna Reş di rewşeke wiha kambax de û di ser de jî li zîndanin eskerî, nivîsî.

Hejahî û qîmeta berhem û eseran li gor dewr û deman e. Di hin deman de nii/îsîna peyveke an goûneke bi sere xwe şoreş e, bi rûmettirin

tişt e. Di hin deman dejl bi cildan kiteb nivîsîn ne tu tişt e. Tişt ti ku berhema Musa Anter Birîna Reş dike neniir û hijahiyeke giranbuha

didiyi, ew dewr û dem e. Di wi dewr û dema kambax de ku keşi newiribû gotina "Kurd" bi lev kira, ku keşi newiribû rizeki bi Kûrdi binivîsa hingi Musa Anter piyeseke (şano) hija bi zimani Kûrdi nivîsî.

Eğer ez ne şaş kim, Birîna Reş kitiba yekemin bû ku piştî damezrandina

Komara Tirkiye, 1923, bi zimani Kûrdi dihat nivîsîn û weşandin.

Cama şîrne û rizine bi Kûrdi li dema diweşîyan li mîna kitib,

Birîna Reş bû ku bi zimani Kurdt ronahî didît û cihî xwe yi bi

rûmet di tarvca pişveçûna ziman û edebiyata Kûrdi de v/erdigirt.

Em ji iafbca tevgerin çandî û ronakbîrî yin neteweyan dizanin ku ronakbîr û pişewa ew Jtes e ku gaven nû davije, ri vedike û ri nişan dide. Gava ri vebû û li ber meriva diyar bû, kesin ku xwe bidin ser ri, pirr in. Li hijatirin gav û kirin ew tişt e ku meriv riveke. Digel her celeb dijwarî û kimaniyi, meriv bikaribe afirîn, berhem û eserin nû û pewist bine pi... Birîna Reş û niviskari wi Musa Anter misalin vi yeki ne.

Musa Anter di kurte pişgotina xwe de dibije: "Li rojhilate (Kurdistanî M.U.) birinin reş pirr in. Wek bîrova çavan, îşa zirav, kotîbûn û yaji wan gişa diwartir û diya wan, jarîti û nezani..."

Piyesa Musa Anter dermani birinin reş e. Jarîti û nezani jahreke beeman e ku dikeve can, ruh û bedenin gel û neteweyan û wan dike dil, wan ji hev dbâne û wan dike şerpeze û peregendeyen ber deriyin

serdest û zordaran. Dermanijarîti û nezaniyi ronahiya perwerî, medeniyet, xwendin û nivîsîn e. Nivîskar piyesa xwe li ser vi daxwaz û armanci ava kiriye. ew bi zimani xweyi xweşik nezani, paşdemayîn û belengaziya civaka Kurd salix dide. Gundi Zoravi, mala Zîno û Biro nimûneyin rebeniya civaka Kurd in. Li li mili din lav/i wan Bedo ku qehremani piyese ye, ronahi ye. Evi hiviya pişeroja civaka Kurd e. ew nimûneyi perwerî, xwendinû pişveçûni ye. Ew dibe doktor (bijîşk) û birinin insanin Kurd derman dike. ew dibe dermani birinin reş... .

Gava min Musa Anter cara pişin li Girtîgeha Eskerî ya Diyar-bekre dit, 1971, hingi gunehi min pi hat. Ez xortekî 18 salî, ew apekî 55-56 salî bû. Pori wî spî bû, ew li ser riya kalbûni bû. Le ptstî min ew ji nizîk ve nasî, min fim kir ku ez şaş im. Musa Anter ne ew meriv bû ku meriv gunehi xwe pi bianiya. Berevajiyi wi, baweri dida

merivan. Wî bi gotin, lebat û tevgera xwe baweri û germahî direşand

ser girtîgehi. Wî girtîgeh, wari bîhtengî û gumanan, kiribû wari kifû henekan. Girtîgeh ji re bûbû seyrangeh. Gundiyen bîhteng

û bi şik û bi guman, xwe dispartin wi û derd û keser û gumanin xwe bi gotin, henek û şîretin wî derman dikirin. Nivîskare Birîna Reş li girtîgehi jî li ser riya armanc û mebesta piyesa xwe bû. Birîna Reş xvîediyi ciheki pîroz e. Daxwaz, armanc û mebesta wi pîroz e. Loma ew diviji bîr nebe û car bi carji nûve bi weşandin û belavkirin.

Mehmed Uzun

Xwendevanin delal

Min ev pirtûk sala 1959'an li Stenboli, li Harbiye di hucra 38'an de wexti ku ez girtî bûm, nivisîbû.

Tiştin ku huni di vir de bucwînin gişfe serpihatiyin min in.

Li Rojhilati "Birinin Reş" pirr in.

wek bîrova çavan, îşazirav, kotîbûn û aji van gişkan diwartir û diya wanjartî û nezanî ûfeqirtiyi.

Huni niha tiştin ku van îş û bela anîne seri me, di ve pirtûki de bibinin.

Musa Anter

24 Çile 1965

Suadiye

LÎSTIK

KESEN LÎSTIKE

ZÎNO

BIRO

M1STO,  
BEDO  
APE SADO  
SEROXAN  
KELÖS  
REŞO  
XENSE  
SİLO  
XORT  
GÛLE  
BUHARE  
PERDE I

Cihe bûne: Gûndeki began li deşta Diyarbekri, navi gund Zorava.

Temaşegêh: Mala Biroyifeqîr i merebe, mala beg li Zorava ye.

Mal, odeke kerpîça ye. Di ode re re dere axo. Hundir reş û qirijî ye. Mal, jiderve bi tapiki rixi sayandiye.

Qir û qahfe mali: Çewalekî nîvî arde ceh li ber dîwer. Si-çar lihif, döşek û halîfen kapikî yen qetiyayî û nerûkiri di kulîni de ne, merşeke mûyî qetiyayîjî bi wan de kiriye. Teştek û beroşek pînekirî û ne spîkirî. Bging û hesfeefee şikestî û cirekî dev şikestî bi cebar, di cîcerk de. Hewtiki mirîjfean li ber deri. Kurtani kere i kevn li ber stûniye.

Zîno, li ber çewil, ard bijingî teşta xwe dike. Jina Biro Zîno, heşt zik zaro anîbû. Difeqîrtiyi de bûye hestî û çerm. 45 şaliye li bûye wefe ptrefe 70 salî. Kirasefeî cawi kevn î bi tisi li ye, ser herdu piyi wi qetiyayî, pişmalkek kevn li bere, pişta wijî wefe kincin wi gişfe kevn i quliptiye. Kitanek kevn di bin guhi wi de ye û seri wi wefe e pîreken deşta Diyarbekri gişan bi kofî ye.

Di wi demi de Biro misasa wi di dest de, nîr û gisni wî di stû de, betili ji cot ti mali. Nîr û gisni xwe dispire kurten û misasa xweji dispire ber dîwer. Ji ber ku desti Zîno di hevîr de ye, Biro ji xwe re 15

mersi radbce, balîfekîjî datîne ser cil û rûdine. Biro 50 salî ye. Li ber roji şewitiye. Kirasekî cawi spî, qutikekî çiti sor û qetiyayî li ye. Şefqa wî bi pîne û berçavka wi şikestî û Biro berûpaş daye sere xwe. Riha Biro ne sofîkî ye, li hatiye.

Bavi Zîno sala seferberliki çûbû eskeriyi û venegeriyabû. Piştî çend salan kii diya wijî mir, Zîno ket nav mala begi Zorava li Diyarbakre. Biro, Zîno ji mala beg xwestibû. Hîn bi keçikanî Zîno kiribû dili xwe:

"Ku rojeki zaroken min çibibin ezijî wan bişînim mektebi."

Piştî ku Zîno mir kir, 8 zaroken wi çebûn, 7 ji mirin, lawefei wi teni maûewjî şandibû mektebi, wi şali wi lîse xelas bikira, navi lawik Bedo ye.

ZÎNO - De Biro, deste min bi ard in; hema ji xwe re merşe deyne û wa ye nan û dew û te divg ji xwe re serîk pîvaz jî werîne û bixwe.

BÎRO - De bila Zîno.

ZÎNO - Ma eze çawa bikim Biro, beri niha ez hatim. Ji bo we firka dew bi pore spî her ro beta nîvro tewer em zibl xelke reş dikan.

BÎRO - Ma tewer ez Zîno! LS-ma em çî bikin, tewer te kaxeta Bedo neda xwendin, gelo digo çî?

ZÎNO - Tew, tewer min ji bîra kir. Ma te aqil di sere min de hisliye? Ere, Keye xwend. Laye min mekteba xwe qedandiye, kare xwe dike, van rojan bi xâr we b male. Te dît Biro, te digot

bila Bedo nexwîne...

BÎRO - Ha ho, hema ku kûre we xwend tu dibe qey we bibe çi?  
Tewer Zîno tu zanî ku te ev lawik xera kir. Hevalfi wî giş ev  
10 sal in ku ji xwe re şivantiye dikin. Rec Silo, îro ji 10 bizinan  
re nabe pez. E te, te hîn bi mektebe\* girtiye. Xwezî te  
wan her penc salan li mala beg ceritî nekiriba û tu hînî ve  
xwestina mektebe nebaya.

ZÎNO - Ere Biro xebînetî jîna min î ku bi te re vala çû. Tu li min  
biner, li xwe biner. Ev bû sîh sal ez li ba te me. Ma te rokfe ji  
min re kirasek kirî, taqik kiri, solek kirî? Na. Saleke me wek  
mirovan ter nan xwar? Na. Salewext wek girtiyan ez û tu em  
16

dixebitin, dîsa zikekî ter, yekî em birçî ne. Firdoka taştîya  
mala beg ku hîn giş di xew de bûn, me ji wan re rez fikir, çe>  
tir bû ji vî nane ceh û pîvaze tûj î ku bi xebata xwe yî şev û  
roje\ incex tu kari bixwî.

Tu li mal û qirqafe xwe biner, tu li ser û sekehe me biner, ma  
gelo giş bSn firotin, buhayê we terişka ku beg jâ re digot "qerewat"  
û bertelef fikir stûye xwe, dikin? Na, ez yeqîn nakim.

BÎRO Ere Zîno, gotina te ye, le tu jî ji xesîsî li xwe nakî, ma ez  
nizanim ku pere te pirr in. Bi sere şex îrö çiqas li ba te tunebe,  
nezîkî bîst banqenotan hene. De li xwe ke, ma min nehiştîye.

ZÎNO - Pepû! Ma eze bem çi Biro. Kuro we çawa evqas pere min  
hebin? Bi buhayê heke se mirişkan û teşîka ku ez ji xelke re  
dirâsim? Hîn nû mala Hecî Ferman sere weqîya ristina hiriy  
kirin wereqe, le îca jî mirişka me ya zer ji heka qut bû. Te dît  
diberî Xwede du tiştan bi hev re nade feqîran, ku yeke dide  
yeke jî distîne.

BÎRO - Çawa dibe Zîno! ew mirîşk tu carî van çaxan ji hek nediket keçe?

ZÎNO - Biro welleh ez jî wiha dibejim. Bi gumana min li ser motka mirîşken mala mele dike. Le we roje min pirsî, diya mele sed sûnd xwarin, go na!

BÎRO (Bi ken û bi kij) - Naxwe sere weqye kirin penc mecîdî, he? Welleh ne hindik e. Le bavo ez zanim, dîsa ti be pere min tû-ne ne.

ZÎNO - Jixwe. Ma wek bere hez bi min re maye? Ev meha çûyî, bi zore min penc weqî hirî ristin û hîn badana wan jî xelas nebûye. Kare male û ceritiya xelke giş di stûye min de ye.

BÎRO - Ere hema penc weqî jî ma hindik in? O hek jî.

ZÎNO - Ihi! Hek kuro hek! Hema ev meha çûyî min penc hek ji te re kelandin. Tobe bi deve min neket. Xwede ew penc. Ê Fato jî di birina bajer de sise şikenandin ev neh. Na na, nale li derewe, heşt. Tev de pencî hek bûn. Hema ez nizanim, Fato yek daye bi nîv mecîdî, bîst û mecîdîk da min.

BÎRO - Te dît, bi e res ev bûn neh zer û mecîdîk. Ma ne bes?

ZÎNO - Ere Biro, gotina te ye, bi rastî ne hindik pere ne. Le hayS  
17

te ji tiştêkî tûne. Niha tişt giş buha ne, e de mal e, tu bikî nekî ma biwe nave, ma gaz nave, tu bawer nakî, çiqas ez bi qitûtî idare dikim, dîsa jî weqek dohne gaze tera me nake. Dîsa ez çirake diduyan jî, ji cîranan dixwazim. We roje ji bo nale kera te, min deh mecîdî dane kirîve îşo, bi zore girt.

Ê laye min? Ere li mekteba hikûmete belaş dixwîne, dixwe û vedixwe, le ma dîsa tu bikî nekî pere jâ re divân. Tu yeqîn nakî ji Keye bipirse, îsal belkî min sîh-çil wereqe ji laye xwe re



şandin.

BÎRO - Tewer Zîno, min ji bîr kir, ew tiştêkî wek qoçana jî di nav kaxeta Bedo de bû, Keye nego ew çî bû?

ZÎNO - Ew?... Ere tewer min ji te re negot, midîr ji te re şandibû, silav li te dikirin.

BÎRO - Cima? Çî dixwest Zîno?

ZÎNO - Tişt nedixwest Biro, ew ne midîre xwestine ye. Ji ber ku îsal laye te di mekteba Diyarbekre de suxte heri xurt û jîr e. Ji ve yeke te pîroz dike.

BÎRO - Ê onbaşî, cendirme Dursun wan jî tiştêk negotin?

ZÎNO - Kuro cendirme çî, onbaşiye çî? Kaxet ji midîre mektebe bû.

(Di we çaxi de, Zîno hevîri xwe straye, paçekî bi ser de dike û di sanki de desti xwe dişo û bi pişmalka xwe ziwa dike û li cem Biro li erde rûdine û dest bi kevniki kirasi Biro pîne dike.)

BÎRO - Çî, çî, ma li mektebe jî midîr heye? Min digo qey ji midîre nehiye Turan Beg e, ez şa bûbûm, midîre mekteba zarokan, tew tew Zîno... li aqle te bî.

ZÎNO - Tu li Biro binerin kuro. Tewer midîre mektebe nakeve ser re wî. Biro, midîre mektebe ji midîre nehiye pirr mezintir e bavo!... Rojeke xanima mezin go zaroke ku li mektebû dixwînin dibin midîre nehiya.

BÎRO - De tu jî le be aqile, xanima mezin... ew pîr bi çî zane, ma rojeke ji köşke derketiye çûye nehiye? Bi nave Xwede tewer diben Turan Beg neçûye mektebe, ji Qeyseriye ye û Demoqrat e û hema kirine midîr û şandine nehiya me.

18

Wekî din jî keçe Zîno, ma li dinyaye kî ji midîre nehiye mezintir

heye, cerî û xulame wî hene, şîr, rûn, penâr, mirîşk,  
hingiv, zad, berx her tişte wî belaş in. Hespe wî belaş e, ez zanim  
ji bo we doza erda Mala Hecî dan.

Tu zanî, we roje gundiyan Kerbetiliya li hev xistibûn, bi zor  
û ricaye hezar benqenot dane Turan Beg, heta ku wan li hev  
anîn. Tewer bi ser van gişan de jî midîre nehyg li ke xin bi qîma  
xwe ne, kes nikare giliye wan bike, ku bikin jî ser nagire.

ZÎNO - ew ne te de Biro, hikûmet bi van hawan nizane; ma nayâ  
bîra te we sale, ew nave wî çi bû Xwede?... E... Atilla bû,  
gilî le çebû û kirin bendexane (hepse).

Le hîn kesî nediye ku midîre mekteban ketine bendexane.

Tewer bi ser de paşe, walî, hakim û mezinân din tev de derin  
deste wan, ji ber ku seydaye gişan e.

BÎRO - Bemejiyê Zîno, ez bi van hawan tev de zanim, I hikû-  
met nizane ne?..

Turan Beg, merik van îşan bi dizî dike. Peş çave onbaşî û ew&  
Demoqrat ku je re diben Ocak Başqanî dike. Ma we here An-  
kara rûne û hingiv bide hev, heta ku hikûmet dibîne.

Bedela ku hikûmet ji veqas hatina midîr beş û salyana bistîne,  
tewer bi ser de, mieş jî didine. E te, te hîn daye pey midî-  
re mektebg û xanima mezin. '

ZÎNO - Welle Biro, ez bi van hawan nizanim. Çaxa ku ez li ma-  
la beg dixebitîm Kemal Paşa sax bû, ne ev Demoqrat hebûn,  
ne sereke ocaq mocaqan û ne dizî û bertîl hebû. Qey niha wiha  
bûye, ma sûce hikûmeta feqîr e? Tişte ku ez zanim midî-  
re mekteban pirr qenc in û tim paqij in Biro. Taliya diziye tû-  
ne. Ma te ne digot, diz ji xwe re male nakin, le mala xelke xera  
dikin.

BÎRO - Keçe Zîno, niha tişt hemî di destê wan Demokrat û ocaq başqaniyan de ne. Niha hikûmeta ne padîşeh çedike, ev ocaq başqanî çedikin, ji vî hawî , hikûmet ji wan ditirsin. Onbaşî jî ji wan ditirse.

CDi ve gavi de, feeçifea cîrani wan Zero dikeve deri, le ji Birofedî dike û bi paş de vedikişe.)

19

ZÎNO - Were keçika min Zero, were, kesî nenas tûne, ape te Biro ye.

ZERO (Bifedî û hidî) - Amojne, diya min go bela meta te selikek ard bi deyn bide me.

ZÎNO - Lawo bi sere Bedo tûne, ma ku heba ne şerm e.  
(Keçik bilez derdikeve û dere.)

BÎRO - Zîno ev keça ke bû, çi dixwest?

ZÎNO - Çîk lo, qîza Neyo bû, tebeqek ard bi deyn dixwest.

BÎRO - Ma te cima nedayâ?

ZÎNO - Ma arde min ji wan re dibe Biro? ew genim dixwin.

BÎRO - Guh mediye Zîno, dîsa cehe me ji genime wan çetir e. îsal hevqas sal e em dixwin, ma te ev "Birîna Reş" dîtibû, bihîstibû?

Na, ne ew nane genim, ne ew "Birîna Reş." We roje ez di ba mala Xelo re çûm, keçika wan a ku sax maye derket, gaye min je tirsîyan. Dile min zahf pe şewitî, te nizanîbû feqîre ne însan e, ne heywan e. Ere i me jî gelek zaroken me mirin. Zarok in helbet we bimrin le ne bi vî hawayî. Mirina wan zarokan gelekî zor e. Bi saxî goşte wan tev de ji wan de dikeve.

We roje lawke Kelos, Sekban miribû. Mele li ser deri şûşt, min dît, kes nebîne, komikek hestî mabû. Mala mine, ew Sekbane wek bencikekî, lepek mabû, min nâs nekir.

ZÎNO - Te dît, tu jî diba "Zarok helbet we bimrin." Ma ji ku wiha ye Biro! Ez penc salan di nav mala beg de mam, min nedît ne zarokê wan, ne yekê beğen cîrane wan mirin. Em gişik, ji birçîtiye, ji tazîtiye, ji lewte, ji serme û feqîrtî û nezantiy dimrin.

Hema e min rebene heft mirin. Ew yek bi tene Bedoke min ma.

BÎRO - Zîno keçe kare Xwede ne, emre wî ye. Tu zanî zarok gûlen bihuşte ne. Ma bihuşt be gul dibe?

ZÎNO - Ere emre wî ye, le ez li gora xwe dibem ma hema emre wî li me feqîran tene ye?

BÎRO - Zîno, îca tu kufriya dikî ha? Mal nexerabe ma tu bi emre Xwede xeber didî.

20

ZÎNO - De na lo, maxwene me gotiye çî. Bi qurbana Xwede bim, ew jî bi heqê nake.

BÎRO - Bavo Zîno, welleh tu eceb î. Keçe ma ku zarok nemirin, hevqas mirov we di ku hilen? Hema li van her se-çar malen me binâr, belkî ev bûn sî çil zaroken me ku mirin.

Behenek Zîno, ku ev zarok nemiribûna, niha dora me bi xort û qîzan w xemilî bana?

ZÎNO - Helbet. Wekî din jî Biro, ev jana Birîna Reş ne ji nane genim e, tu zanî? Diben ji vî tove ku hikûmet dide beg û xwediye gundan ji bo çandine. Ji wî çê dibe.

BÎRO - De here tu jî le, ku dibe ji tov? Ma we sale tûrik genim ji ber tove me ma, me şand eş, we çaxe Bedo jî zarp bû, qet Birîna Reş demexist.

ZÎNO - Biro ev tov ne wek tove me ye, hikûmet derman dike û

paşe dide xwediye gundan ku biçînin, le ew naçînin tinin sûka elafa difiroşin. Par ez çûbûm Diyarbekre, min dît xanima mezin wan digot: "Ji ber ku hikûmet belaş dide wan, ew jî erzan difiroşin elafan, elafjî hema bi buhaye ceh didin feqîran." Niha ev Birîna Reş ku goşte zarokan ji wan de dikeve, ji ber vî dermani ye. Diben ev derman jehr e.

BÎRO - De bes e le Zîno tu jî ha! Ma hikûmet dîn e ku me jehr bike, paşî we kî here eskeriye, wê kî xerc û salyana bidiye? Pa welle paşe we dijmin ben me tev de talan bikin û bikujin.

ZÎNO - Pirsar te ye Biro, hikûmet me jehr nade, ji bo ku biçenin genim derman dike, le yen ku distînin difiroşin û ji feda xwe xelke jehr didin.

BÎRO - ew jî derew e. Te dît par bihare ez jî çûbûm bajar, bi gumana min, sere meha Gulane bû, ceh jî seridî bûn. Bi Beg re em çûn sûka zed, ji wî genime ku tu dibejî hikûmete sed ton dabûye, wî jî firot elafan.

ZÎNO - Te dît, ma min ji te re negot; ew difiroşin, hikûmet nizanê, ew dibe qey diçînin.

BÎRO - Pite ma hikûmet dîn e? Çawa nizane ku Gulane genim li Diyarbekre naye çandin, derew derew, qey nave wî genime bizir e, yan na ne ji bo çandiniye hikûmet dide?

Wekî din helbet we hikûmet genim bide began, ma wek me  
21

karin nane ceh bixwin?

ZÎNO - Te go çend ton, çend ton?

BÎRO - Sed. Zîno ev ton çi ne? Tu tiştên wiha zanî, kel in gelo, ez dibem hema ton kelen hikûmete ne?

ZÎNO - Ha here Biro, ne kel mel in, weke ku ez li mala beg bim,

huqqa, tuxt, qentar hebûn, le min ton nedîtin. Xanima mezin cama digot hevqas ton.

(Di vî hawî de Api Misto ti hindirû û silavi li Biro dike.)

MISTO - Biro, hîn tu nû ji cot hatîyî, cima tu ma dereng?

BÎRO - Ere welle Misto. Ma ez çî bikim, çeleken min birçî ne, qels in, ber derhaxin.

(Biro ji ber Misto radibe Û cihi xwe didiyi, li Misto hema xwe berdide erdi û rûdine.

BÎRO - De kerem bike were ser cilan!

MISTO - Na welle, vîr heniktir e, xweş e, tu betilî yî, rûne, cote bihare zor e le zâhf baş e. Ne wiha ye xweha Zîno?

ZÎNO - Ma ez ji ku zanim Keke, ev sî sal e Biro tim betilî ye, tab û xebata wî, giş ji xelke re ye, aha va tu me dibînî, cote biha-  
. re qenc be e me çî, ne qenc be e me çî...

MISTO - Wiha ye xweha Zîno, ma eme çî bikin; dest û nige me giredayî ne. îdare ne rehet e.

ZÎNO - Cima Keke, welle e ku v£ deme zanibe, zahf rehet e. We roje Ahmo çûbû civata Dcmoqratan li Bismile, gava ku hat kes nizane be çiqas tişt û mişt anîn, çaydan jî aniye, Ahmo niha her sibeh çaye jî ji zaroken xwe re çedike.

MISTO - A partiya (benda) wiha ye xweha Zîno le ev ne kare min û Biro ye, em bi zimanan nizanin, çê nabe.

E tewer ez ji bo lawike we hatibûm, behenek bixer kengî we be?

ZÎNO - Xera Xwede li te be cîran, van her çend rojan we be, ke ji te re got?

MISTO - Kehye got.

22

ZÎNO - Ere rast e, ewî kaxeta Bedo ji min re xwendibû.

MISTO - Bedo ji zû de dixwîne bavo, ev bû çend sal?

ZÎNO - Ev bû yazde sal, ape wî, le îsal jî bixer mekteba lîse diqedîne.

MISTO - Biro ev lîse mekteba çi ye?

BÎRO - Bavo welle ez jî nizanim, ji Zîno bipirse.

ZÎNO - Helbet ez zanim, lîse, mekteba Diyarbekre ya heri mezin e, beg hewqasî xebitî, kir nekir, ne Mete û ne Cengîz lîse xelas nekirin.

BÎRO - Eh bi Xwede kî Misto, tu li aqle we biner, zaroken beg lîse neqedandine, e Zîno qedandiye. Hema ku wiha be, naxwe lîse tiştê ne qenc e. Keçe Zîno ma ku qenc ba, began ji me re dihiştin?

MISTO - Bira xweha Zîno, zaroken ku lîse diqedînin dibin çi?

ZÎNO - Keke Misto, dibin hemî tişt, le laye min dibe, "Eze herim Stenbole, hîn bixwînim."

BÎRO - Ihi, dibin hemî tişt qurre? Îca Zîno niha Bedo kare bibe onbaşiye cendirman?

ZÎNO - Biro ma tu dîn î, Xanima Mezin go ku Bedo Beg here eskeriye we bibe zabit. Ji niha ve temame mala beg, ji kûre min re diben "Bedo Beg."

MISTO - Tu bi qedre Xwede kî Zîno, mehele ku ji lawe te re bejin beg, tu nizanî be ve begîtiye çi aniye sere me feqîran.

ZÎNO - Ere Keke welle gotina te ye, le te dî, yanî min go ew dibejin.

BÎRO - De dev ji Zîno berdin lo. Laye xelke bûn xwedî jin zaro, pez û dewar, e me hîn Zîno daye dû pirsê Xanima Mezin. (Biro bi ken û qerf çav dike Misto.) Baye'sor bi me keve. Te digo qey keçik li deşta Diyarbekre qeliyabûn, di çavdînî dinye re min çû Zîna Xanima Mezin anî.

ZÎNO (Bi ken) - Ere Biro xebera te ye, tu niha be çi xebera te ye. Xuya ye ku te ew lav lav û berger ji bîr kiriye. E ma eze çi bikim; tu bi gorî wî lawikî bî, yan na min zanîbû...

MISTO - Na! Xweha Zîno, a vega tu fenha dikî. Ez zanim ku tu hej ji Biro dikî.

ZÎNO - Ma eze çi bikim Keke! Ma ez karim wek xelke her roj  
23

mal û meran biguherim? Bave laye min e, ev bû sî sal, edî em bûne wek merive hev, ma yan na te go qey ez aşiqe çave Biro me... " ' .

(Çaxi ku Zîno van dibije, Biro wek zarokan bifedî li ber xwe di-  
nere.)

MISTO - Ez bi te şa dibim xweha Zîno, helbet wiha ye, bû dereng, ez ji bo pirsê Bedo hatibûm, de niha ez çûm, bi xatire we.

(Biro nan, dew û pîvaza kuji ber xwe dabû'alîkî, piş Misto dike û...)

BÎRO - Tewer min ji bîr kir. Tu bi qedre Xwede kî Misto, te be nen bixwî.

MISTO - Sundan li ber min daneyne. Bi sere te min jî xwar û ez rabûm hatim.

BÎRO - Biner Misto pîvaz e ha, ez zanim ku eşqa te te de ye.

MISTO - Ere welle Biro, wiha ye le de ne min jî pîvaz xwaribû û ez hatim. Ferso zane ku ez hej pîvaze dikim. Carna ji min re ji nav gund peyda dike. Wekî din jî tu sax bî, îsal em ter pîvaz in, çend şal kaya min a zede hebû, her ku min dibir qeze, çare min du-se weqî pîvaz dikirîn.

BÎRO - Noşîcan be Misto, tu zanî ez narim derke, Zîno tişte wi-



ha zane. Hîn ji havîna par de hılanîne. Le xebînete, îca şîn di-  
bin.

ZÎNO - Ji ku? Na welle e min jî nemane, qedere çend seriyan hene,  
min go belkî lawik be, eze je re bikim kutilke hekan.

MISTO - Ho ho... Naxwe xweha Zîno hîn burxul jî li dora te maye.

ZÎNO - Ne here Keke, qedere senîk hûrike burxule min maye,  
ew jî me ji ber Biro veşartîye, ku zanibaya niha ew jî bi me  
çekiribû.

MISTO - De zarono ez çûm, bi xatire we.

24

(Zîno û Biro, herdu bi Misto re radibin û heta devi deri wî bi ri  
dikin û dîsa Biro û Zîno vedigerin. Zîno radihije teşîya xwe dirise.  
Birojî kurtani kerî xwe îne ber xwe ûcilik miliki wî bi hev de didirû.)

ZÎNO - Tewer Biro ku lawik be, eme nen çawa bikin?

BÎRO - Cima ma ev ne ard e di çewel de ye?

ZÎNO - Ere ard e le ma ne lawik nikare bixwe, ceh e.

BÎRO - Keçe de bes Pite, îşan ji min re derriexe, ceh meh ew e,  
nane bav wî ye, we bixwe. Eze niha genim ji te re ji ku pey-  
da bikim?

ZÎNO - Biro çenabe qurban, zor e. Lawik îsal hevqas sal hînî na-  
ne genimî bûye, we çawa îca rabe ceh bixwe. Ez zanim we nesax  
bikeve. Ma naye bîra te, sala ku te ez anîbûm ji ber ku ez  
jî li mala beg hînî nane genimî bûbûm, wextî ez bi nane ceh  
miribûma.

BÎRO - Ma ez çawa bikim, çi di destê min de heye? Pere te hene,  
genime mala beg jî kehya difiroşe, de here ji laye xwe re bikire,  
ma min nehiştîye?

(Zîno girîkekî ji ber piştî xwe derdbice. Teniştî xwe dide Biro ku

nebine û ji nav girika xwe, pazdeh kaxetan derdixe û dide Biro.)  
ZÎNO - Biro, olçekik hebe, besî wî ye. De ha ji te re ev pazdeh  
kaxet olçekike ji me re werîne. Ez û tu eme dîsa bi dizî ceh  
bixwin, le biner Biro, tu bi sere Bedo kî, lawik nebihîze. Tu  
zanî ku kûre min pirr kerbok e, ku bibihîze em ceh dixwin û  
ew genim, îca we ji kerba nesax bikeve.

Dawiya perda yeki

25

## PERDE II

(Temaşgeh dîsa mala Biroyi feqîr e. Bedoji mektebi hatiye. Bi kin-  
ci mektebi nizîkî diya xwe li ser balîfkî rûniştiye.

Zîno, li ber keware teşiyî dirise, Birojî li ser mersi pal daye ser  
balgeh û bi kif li law ûjina xwe meyze dike.

Kincin Biro in beri ne. Yanîkirasû derpikî caw i pînekirî. Quti-  
, feefeî çiti sor. Şefqak kevn, bi pîne .û berçavk şikestî. Ewjî Biro  
paşûber

li seri xwe kiriye. Rîha wî hatiye.

Zîno; kirasekî cawî sor li ye, piştik kevn li pişti ye, peşmalka wi  
kevn û çitkû zirîkî ye. Seri we wek e deşta Diyarbekri gişan bi kofîye.  
Bi vî hawayî malî li hev rûniştine û bi dibcweşî xeber didin.)

BÎRO - E Zîno! Ez dinerim tu pirr bi kef ı.

ZÎNO - Ma cima eze ne bi kef bim Biro? Maşele laye min wek şe-  
. rekî li nik min rûniştiye. Tu dibe li temame dora me yekî wek  
kûre min zana heye?

BÎRO - Ha hû Zîno. Zaneya kûre te, kesî nediye. Aha va rûwe wî.  
Par roke min bi xwe re bir cot, nîr berûpaş danî ser stûwe ga.

BEDO - Yabo, we çaxe min hîn nedîtibû. De ka niha min bibe,

26

,tuy bineri be ez çawa zanim.

ZÎNO - Hema lawo bela tu qet nizanibê cot. îsal çil sal e ew bi dû helet de ye, çi bi ser xist? Tewer diben mala beg we berdî cotkariyan, we mekîna cot bînin.

BÎRO - We çawa bibe Zîno? Ma ku mekîna cot be, we hevqas gundî bi ku de herin?

ZÎNO - Bi ku de derin bela herin, ma beg we mijûlî wan bibe? Dîsa bege me ji e xelk çetir e. Wan, îsal 4-5 sal in mekîne anîne gund. Li ser kêse xwe tene diçînin û berdî gundiyan, feqîran hemû çûn bajar majaran, en ku mirin, en ku bûn parsek. Diyarbekir bûye wek we sala ha, tije parsek bûye, mirov ji bo wan jî û ji ber xwe jî fedî dike. Le ma we çi bikin jaran, di bajar de ji parse pe de kar tûne.

BÎRO - Ez bawer nakim ku hikûmet bihele beg gundan xera bikin...

ZÎNO - De lo Bedo tu li aqile bave xwe biner. Biro, ma hikûmet kare nehele? Gund tapa beg e, çi bike bi qîma xwe ye. Heke te nave tewer bi ser de hikûmet eve ku ji wan re diben terekto jî dide beg û xwediye gundan. Te dît tov jî dide, le ew naçenin, difiroşin.

BÎRO - De ez çawa bikim, hema bela sere hev bixwin. Tu çi ditirsî rebene, hema em bi ku de herin ji vî hale me ye niha xerabtir tûne.

ZÎNO - Çawa tûne Biro, hema çawa be li gund em li mala xwe ne. Kes bi hundire me nizane le sibe ku em tekevin bajar û ber nigan, çawa ne xerabtir e? Ma gelo tiştêk je zortir heye ku mirov parse ji ewe ku mirov dixê vî halî de bike? Ere gund ne e me ye, xanî ne e. me ye, le li nav mezêl heft xaniye me

hene. Eze dev ji tirbe xwe berdim herim ku?

BÎRO - De bes le, car din te qala miriyan kir. Jixwe tu, tu cari xweş xeber nadî. Pirsas te ya mirin e ya beg in. Ere de ka be-je be ma we laya te bibe çi?

BEDO - Yabo ma te dive ez bibim çi?

BÎRO - Onbaşiye cendirman? .

BEDO - Çawa onbaşi yabo, onbaşi çi ye?

BÎRO - Çi? Tu ye hîn mezintir bibî Bedo?

27

ZÎNO - Jixwe Biro, ma tu nizanî ku we laye min hîn mezintir bibe?

BÎRO - Ha ho, Zîno niha kare be we laye min bibe Midîre Nahye.

BEDO - Ere Yabo, ez karim bibim midîr, le hîn tiştên ferztir hene.

Wek dixtoran, mihendizan, hakim û ebûqatan.

BÎRO - Kuro lawo, tu jî wek diya xwe yî. Kengî te dîkin ewe ku tu dibejî? Hevqas zaroken beg û axa qeliyane ku te bikin midîr û dixtor?

BEDO - Na yabo na, niha ne wiha ye, kî bixwîne dibe her tişt.

BÎRO - Çawa dibe lawo, ku wiha buya ji ber ku feqîr zaroken xwe bikin şivan û gavan, we bavejin mekteba bikin midîr û hakim. Tewer Bedo, ew mekteba eve ku je re diben sawcî li ku ye? Tewer lawo ew wek eğir in. We sale em gundî birin, sawcî go li wan xin, li me dan, go bigrin, em girtin, go berdin em berdan. Hema kesî ew sawcî nedîbû. Mirov ji yekî re be şeqamke li filankes xe, saleke dixin hepse, le sawcî sale sed cari ji hakim re dibe filankes li dar xin, daleqînin, kes wî nag- . re. ew pirr baş e lawo, le ji ku te, kengî te dîkin ew?

BEDO - Dibe Yabo, çawa ez nabim sawcî? Zarok giş dibin her

tişt! Le ji ber ku bav nezan û feqîr in, zaroken xwe bi xwen-  
. din nadin, dikin şivan û gavan.

ZÎNO - Ma Biro ku ne ez buma te ye ev lawik bida xwendin?

BÎRO -Bi rastîna!

ZÎNO - E... En din jî nola te ne. Hûn nizanin ku hemî tişt bi  
mektebe ye? Welle rojê Xanima mezin got, kalîke beg jî ni-  
zanim ji kîjan gûnde Lice hatiye Diyarbekre û xwendiyê bû-  
ye beg.

BÎRO - De le, dîsa Xanimê mezin, tu zanî ku beg pirr zana ye. La-  
wo Bedo naye bîra te, par hatibû vir, ji te re negot; "Ulan oku-  
yup da ne olacaksin, baban gibi işine baksaydın, daha iyi de-  
ğil miydi sanki?" "Kuro, ma ku te xwend tu ye bibî çî? Te jî  
wek bave xwe li kare xwe meyze kiriba ne çetir bû?"

BEDO - Helbet we wiha beje. Yabo îsal çil sal e tu je re dixebite,  
ew dive ku ez jî çil salî ji laye wî re bixebitim, ma yan na ni-  
zane ku xwendin û mekteb, ji şivantî û merebiya wî çetir e?

28

(Di vi derxeqî de cîrani wan Api Sado, Kelos û Saroxan tin mivanî  
wan. Li ser mersi rûdinin û dest bi qîsse dîkin.)

ZÎNO - Biro-rabe, mevan hatin.

APE SÂDO - Zîno, lawo çave te ronî be, maşele Bedo bûye xort.

Tu bi xer hatî xorte delal. Xwede te wek nave te mezin bike  
û xan û man ji te here.

BEDO - Ez tem deste we kalo.

ZÎNO - Xwede ji we razî be cîran.

SADO - Binerin zarono! Kî beje ez tim hevale mektebe me, di  
seferberlike

de zabitekî me yî Silemanî hebû, nave wî Mam Xidir

bû, rehme le be, tim digo; "Zaroken xwe bi xwendin bidin, ku ne bi wiha hûn xelas bibin, tu cari hûn ji vî halî xelas nabin."

ZÎNO - Rebî cihe wî cinnet be, gotina wî ye.

SADO - E... xorte delal, de ka beje be hûn li mektebe hînî çi di-  
. bin? Kehya nava gund tijî kiriye, kaxeta te xwendiyê, dibe  
Kûre Biro xorte mekteba Diyarbekre e heri jîr e. (Û Api Sado  
bi ken) îro ez û te, eme hevdû imtihan bikin.

SEROXAN - Xweha Zîno, çave kehya ne baş in, laye te çavînî neke.  
Ku tu bi a min bikî je re nivîşteke çeke.

KELOS - Gotina Seroxan e. We sale çeleka me nû zabû, di gasîne  
re buhurt, kehya le nerî û got; "Kuro ev çeleka ke ye, guhane  
we çiqas mezin in?" Çar ro neçûn, çelek guhanreşî bû,  
zuwa bû û golika we jî mir...

BÎRO - Ere, tu caran kehya nabeje "Maşele."

ZÎNO - De binerin ha! Çave min birije, ma ez feqîra xwede ji ku  
zanim? Naxwe eze îşev li mal hermele bişewitînim, da çav  
xera bin.

SADO - De tiştê nabe, dev ji van beaqiliyan berdin lo. Le çi çav,  
çi hal? Diben çeleka xelke bîst-sîh weqî şîr didin, qey çavînî  
nabin?

De kûre min Bedo, ma ne me go, eme pirsan ji hev bikin?

BEDO - De apo serçavan, bipirse!

SADO - Na na lawo, te dive tu ji min bipirse.

BEDO - De apo tu zanî, bipirse.

29

SADO - Bedo lawo ev kûsî cima bûye kûsî?

BEDO - Ma apo ez ji ku zanim.

SADO - Ya, naxwe tu nizanî, de biner eze ji te re bejim.  
Diben rojêke di gûndeki wek gûnde me de begek hebû, di desttengiya feqîran de zade wan bi elba mezin û erzan dikiri û di buhayê de bi elba xwe ya piçûk û buha difiroto wan. Ji ber we xayîntiya wi, Xwede beg kir kûsî. Elba wî ya mezin li ser û elba piçûk jî li binê re kire qaçil.

BEDO - Ere welle kalo, ev çîrokeke gelekî xweş bû.

SADO -t Çi çîrok lawo, ev rast e, ma ku ne ji ber xatire pexember buya, tu dibê evê ku niha vî buhayî û hawa dîkin, we nebûna heywan? Bi sere te we çaxê we li Tirkiye hindik însan bimana.

ZÎNO - Lawo Ape Sado pirr geriyayê, gelekî zana ye.

SADO - Na lê ma ez çî zanîm? Biner Bedokê min, heke tu aciz î ez napirsîm?

BEDO - Na kalo, welle min dibê, tu zahf rind xebê didî, ev listen wiha di kitebê me de tûne ne.

SADO - Ev di kitebê we de tûne ye ya? Hûn berûpaş dixwînin. Qaşo bîrê însan heywan bû, peşî gumgumok bûn, dû re bûne meymûn û hîn dû retir jî bûne însan. Sala seferberlike zabîtekî Alaman ders dida me, wî jî wiha digot, a rast ew e ku cîyanê peşî însan e û ew jî Pexember Adem e.

BEDO - Kalo ma...

SADO - Çi kalo, ma tu jî te bî na? De hebî ez yekê din jî ji te bipirsîm. Bedo, kûrê min, ev legleg cîma bûyê legleg?

BEDO - Ma kalo eze ji ku zanîbîm. Behenek me tiştên wiha nexwendîne.

SADO - Hûn naxwînin ya! De bîse eze ji te re bejim.

Rojêke dîsa xwedîyê gundekî pirr dewlemend hebû. Dibê lê wî gundî pîrekek xweşik û diya se sewîyan a bî namus hebû.

Zaroken we birçî diminin û ji neza digirîn. Jinik nema zane we çî bike, aqil di sere we namîne feqîre. Tîşteke jî di destê cîranan de tûne ye ku bidine le je re diben; "Zad li ba mala beg heyê, difiroşin, here ku bi deyn bidin te, eme havine li ser bendere bidine." Diya sewiyan bi fedî û şerm dere ba beg,  
30

derde xwe je re dibeje, le ser nagirî. Zîno jî weke keçika min e, beje tolaz ji jinike re dibe; "Na, ez bi deyn zed nadim, le ku tu serkabe (devlinge), xwe ji xwe bikî û bi ve nerdewane de hilkişî û dakevî, eze tera zaroken te zed bidim te." Feqîr çiqas li ber giryaye dîsa ser negirtiye. We çawa bike, zaroken we li mal ji birçîtî digirîn, gotiye:

"Ya Xwede, tu dibînî, ma eze çawa bikim? Qey emre te ye ev hawe?" O paşe derpiye xwe dertîne û bar şewala bi nerdewane de hildikişe û dadikeve. We çaxê beg jî li ber nerdewane sekiniye, li jor jê li çîme jinike dinere û dikene. Gava ku jinik daket, zade xwe bir, Xwede jî beg mesex kir û kir legleg. Îca ji we çaxê û heta niha hîn jî legleg stûwe xwe bi peş û paş de ditewîne û wek kene wî begî dike leq leq.

BEDO - Ax kalo ev çî çîroken xweş in.

SADO - Tew xorto, ma ev çîrok in lawo? Evna giş bûyen bi sere xwe ne. Ya laye min, ev heywane ku tu dibînî bere tev de însan bûn, ji ber xerabiya xwe bûne heywan. Ker, ga, rûvî, kûçik, kew, kevok...

Ez car dî jî ji te dipirsim.

BEDO - Ere welle kalo.

BÎRO - Lawo Ape Sado pirr xurt e, kî kare pe?

ZÎNO - De Biro, e tu...



SADO - Le, hûn ev mektebliye niha guh nadin heywanen dora xwe, hûn derin nizanim çend qelaçan di bine deryaye de li kurmikan diğêrin. Li sere çıyan li hestiye masıyan diğêrin.

Sala seferberlike li Çeneqela em li sere çıyakî bûn, zabite me digo, ev taht, qaşûlen şeytanoken deryaye ne.

KELOS - Ha hû! Ma ew ji ku zanin vanan Ape Sado. ew bermeqlûb dixwînin.

SADO - Na kuro, ez bi Bedo şa dibim, ma tiştên ku ew zanin, em ji ku zanin, xebera Bedo ye, zaneya me giş çîrok û çîvanok in.

SEROXAN - Na welle Apo, tu tinazân dikî, ma em nizanin ku tu bi qasî melayekî tiştan zanî?

BEDO - Kalo, e min, min nizanîbû ku tu evqas zana yî?

SADO - Çi zaneyî lawo, bertelef e, çi fede me nexwend. Jîna me giş di nav ve qirej û jarîtiye de buhurî. Ê tewer bi ser de jî ew

31

zilma axa û began.

De binerin tişte ku hate sere min ez ji we re bejim: Di çaxa Siltan Hemîd Ê Reşad de ez girtim, şuna laye bire beg de ez şandim nezame, lo ma ez li ku negeriyam, li Selanîke, Yeme- ne, Şame, Bexdaye, Helebe, Qerse me cihek nehişt. Çar caran ez birindar bûm. Di xela û cêla de ez qelıyam. E ku em mirin çûn ji me re gotin "şehîd", e ku birindar û seqet bûn, bûne parsek le di defteran de ji me re diben "gazî" en wek min ku sax jî man em jî bûn köle xwediye gundan. Ev bû hefteûpenc sale min ku ez li vî gundî me. Kehye we roja ha ji min qeherî, bi ve rîha spî îşkî nemayî anî sere min û berda min ji gund.

Dîsa diya wî li ber geriya nehişt.

BİRO - Ere welle kehye kare berde mir6v. Ji ber ku kehye ji gundiyan

re behnteng e, beg gotina wi naşkîne. Wî çende ha beg bi terenîbele hatibû vir, ji me gişan re go; "Biner gundîno denge min be we, kehye min çi bike bi kefa xwe ye."

ZÎNO - Xwed je re nehele.

SADO - De bisekine Biro. Bela Bedo ji me re bipeyive, ma hûn nizanin

ku we beg wiha beje, ma we diye ku seydvana ji tajiye xwe re gotiye; "Ku te keroşk girt meeşîne." Na. Tene ew tajiye xwe hîn nexwarina şeyde dike.

BEDO -Kalo de beje, ma te çi dive ez ji te re bejim?

SADO - Lawo Bedo ji van tiştan nû derketî, se tişt nakevin sere min:

A peşî; diben mirov çûne heyve.

A diduwan; diben îro karin ji vir Çîn û maçîn bidih ber topan.

O a din jî; diben tewer qûmberek çekirine, nave we etom e, çi ye, karin bi yeke ji wan, Xwede neke Diyarbekre bi careke re pe bişewitînin. Me dive tu van texî sere me.

BEDO - Kalo rojnamen me diben Îngiliz û Amerikan gotine mekînek Urus li heyve ket. Le însan neçûne û nehatine. Wekî din jî diben Urus û Amerika mekînen xwe dişinin heta nezîkî heyve û surete we dikşînin. Niha jî tewer Amerika û Urus xwe kar dîkin ku herin heyve û steren din.

BÎRO - Kuro hiş lawo, bi sere şex ev pirsên te ku li nava gund be- ne bihîstin, we ben qey ya tu dehl î ya gawir. Tavile kehya

32

berdide me ji gund. Tobe tobe çawa we herin heyve?

SADO - Bira tu bi Xwede kî hiş! Aqle te ji van tiştan nabire, tewer hîn gundî û kehye we Bedo necebînin? Tu beje lawo Be-

do beje, van feqîran ne xwendiyê û ne geriyane, we ji ku zanibin?

Tewer Biro te eskerî kir?.. ,

BÎRO - E... Hijdeh mehan min eskerî kir.

SADO - (Bi qerf) Errek çiqas pîrr, welle te xwe kuşt, te li ku kir?

BÎRO - Li Serte. .

SADO - Tu çî bûyî?

BÎRO.- Tu çî bûyî?

BÎRO - Ez saîs bûm.

SADO - De te dît lawo Bedo eskeriya Biro. Li Serte û saîstî. Yanî ji şivantiya pez çûye bûye şivane hespan. E Biro tu çawa hînî Tirkî bûyî?

BÎRO - Lawo çî hînbûn û çî hal! Ev çend pîrsen bi Tirkî ku ez zanîm çendek je ji zabite xwe û çendek je jî gava ez bi dergistî bûm, ji bo Zino nezîkî du salan çûm bajar li mala beg dixebitîm. Li wan deran ez hîn bûm.

Wî tew min ji bîra kir, ne beri saleke li nahiye min notirvanî (bekçîtî) kiribû, çend pîrs jî ez ji cendirman hîn bûm. .

SADO - De de Biro bes hînîtiya te!.. Ere Bedo lawo îca ew gûllen ko diçin dûr çawa ne?

BEDO - Kalo ew jî wek ewen ku diçin heyve ne. Le ev ne berjor diçin, rast diçin armanca xwe.

SADO - We dît zarono be xort çî spehî kir sere me. Le çî fede çaxe limeje hat. De biner, dibejin fişten ku nû derketine mirov hînî wan bibe, x6ra wan jî wek a limeje ye. Li eskeriya zabitekî me ye Diyarbekri hebû, ev tim ji me re digot.

KELOS - Na lo Ape Sado, hîn limej dûr e.

SADO - Behenek! E de naxwe bave kalike xwe ka we atome jî ji me re beje. Li seferberlike qe'mbera heri bi qewet je re digotin

"elman bombası" dikarî bi qasî vî hundirî xera bikira.

BEDO - Ere kalo ew qûmbere rast in, le em nizanin be çawa çe dikin, hîn li dinyaye Oris, ingiliz, Amerîqa û Fransa tene zanin û ji kesî re nabejin.

33

SADO - Haho! Car din îngilîz di nav de ye. Naxwe xer te tûne. Tim ew li ber a xwe ne. Ma ne sala seferberlike wan em qelandin. A lawo Bedo heta niha kesî ev qembere avetiye hev?

BEDO - Ere kalo di vî sere dinyaye ye talî de Emerîqa bajarekî Japon, nave wî Hîroşîma bû, ji Diyarbekira me mezintir bû. Bi qembereke atom di cî de sed û bîst hezar însan mirin û bajar jî bi derbeke şewitî.

ZÎNO - Wey le ji Xwede netirsiya! Qey bira ew gawir in bavo!..

SADO - Ere bi Xwede wiha ye. We roje li Diyarbekir li qehwa Ebas jî hin kesan wiha digot le kesî guh nedida wan. Me digot qey polîs û xefiye ne dîsa pirsar ji bin me vedikişînin. Naxwe rast digotin..

E Bedo efendî ew gûllen ku ev qasî dûr dinerin çawa diherin? Bi qebzûn û barûde diçin an ew jî wek firoka (teyara) bi benzinê ne diçin.

BEDO - Kalo me ev qal li mektebe nexwend. Le we roje kovareke dinivîsî ku gûlle wek çend fişekan bi ser hev de ne peşî yek diteqe gava ku heza we yeke nema ya din diteqe. Ê bi vî awayî gûlle dighe armanca xwe.

SADO - Wey tu tim hebî lawo, bi nave Xwede we wiha be!

KELOS - Bavo di eskeriye de min tişte wiha nebihîst.

SADO - Ma te ji kû bibhîzî, e me me hişe xwe berdaye ser telaqreşiya û benda. Ev demoqrat in, ev xelk in, nizanim çî bi me

hatiye? Hema nezîkî sî salî xelk bûn em ev bûn, beg jî xelk bûn. Û îsal neh deh sal Demoqrat in dîsa em ev in û beg jî bû ye demoqrat.

Giş ji me feqîra wek hev in le parti û beg e hev in.

BÎRO - Ji kû wek hev in, welle yabo dile min ji xelke re dixwaze.

.

SEROXAN - Na welle Biro Demoqrat ji Xelke çetir e.

SADO - Xwelî li sere we be. Ma niha hûn zanin. be hûn dibejin çi ahmeqno. Rehme le, çîrokek bave min hebû, ez tu carî ji bîra nakim. Digo: Di xelay de kerwanekî feqîra diçû deste ku ji zaroken xwe re hinekî zad bikin. Le nijdeke keleşan li wan derdikeve dest û linge wan gire didin, davejin bin darek û qirûqar û heywane wan li hey par dikan. Le ji bo qir û

34

qafa, nav keleşa xera dibe û radibin hev bi xencera û çend ji hev dikujin û birindar dikan. Di pevçûna wan de ji dela ku kefa xwediyen kerwane ye giredayî be îca li ber keleşa dikevin û ji dûr ve şîreta li wan dikan ku dev ji hev berdin.

Bi sere we zarono ji aliye van benda de ve em jî bûne wek rewiyen wî kerwanî. Demoqrat bin Xelk bin me feqîra tazî di- kin ku îca bi hev dikevin em diben filankes baş e û filankes ne baş e.

KELOS - Zarono ma gelo bend li nav gawiran jî tûne ne?

BEDO - Çawa tûne, ne, ma Ape Sado?

SADO - Bele lawo bende wan jî hene le dibejin ne wek ye me ne.

BEDO - Ma we çawa wek ye me bin. Li nav wan ne şex ne axa û ne beg hene. Li van deran partî a wan e, em jî ji tirsan wan yê n ku ew dibejin em dineqînin Û ew jî dibin mebus. E, adet e,

mebus jî ji ye ku wan bineqîne re dixebitin.

SADO - De rabin kuro wexta garan be lawo, deste me ji efendi nabe le bû dereng.

BEDO - Min ji te qebûl e kalo. Yade kalo îşev bi me re şîv bixwara.

ZÎNO - E, be henek Ape Sado tu îşev li ba Bedo bima?

SADO - Laye te sax be Zîno, ne adate min e. Le her ku ez vala mam eze serîkî bi we dim.

(Mivan radibin, xwediyi mali wan bi ri dikin)

ZÎNO - Ser çava hûn hatin cîranno, mala we ye hûn kengî ben, bi xer ben.

BEDO - Kalo sibehe dîsa were, îca eze tiştan ji te bipirsim.

SADO - Ez bi te şa bûm lawo, ma ez çi feqîr im ku ez bi te re bikevim şîretan. Ne peşî min got, zilame nexwendî kor te heseb, ma em çi zanin? Zanîna me hemû çend çîrok û L-'rsed peşiya ne.

BEDO - Na welle kalo, pirsên te pirr xweş in.

SADO - Ez zanim lawo, xwende kenge qerfa li mezinên ywe di-kin. Ma ne ji ber vî awayî ku ev îsal çil sal li zimane min mû hatin, ez ji gundiyan re dibem, "Zarona mexwin, venexwin  
35

herin li qiraxe bajarekî ji xwe re webatiye bikin. Le zaroke xwe bi xwendin bidin."

Tu zanî ku Simko bi salan hevale te ye. Deh sala ez bi dû bave wî ketim, min go, "Lawo xebînetê Simko ku nekeve mek-tebe."

Hurmuz bi ya min nekir. Par li gûnde mala begî ber ave pevçûn çebû, yek hat kuştin. Kirin stûwe Simko ji ber ku emre wî piçûk bû. Mala hakim ava deh salî û nîv dane niha di hepsa

Diyarbekir de ye, diben spê çave wê dixwin. Ji rûwe beg hat girtin belengaz! Tewer bi saloxa diben rojê ne beg bi ser Simko de çûye û ne çend qirûş pere je re şandine. E bav jê feqîr e, xulame xelke ye mala mine we lawik di hepse de bimre. Ma ku bixwenda we cima ev bihata sere wê? Bela ew jê wek te niha di nav me de baya belkî wê jê rek bi me xistaya. Tu dineri lawo em giş li van ristan ji ber nexwendine kor û geş mane, her çê te pehîneke li me dixê. Bedoke min encex yê wek we xelas bikin. Ma ku tu ne laye Zîno, ye Beg baya me îro wiha karibû li dor te em rûnen? Her tiştêkê peşê feda wê li cinse wê heye. Ma naben, "Her teyrekê bi refe xwe re."

KELOS - Çawa Ape Sado?

SADO - Wiha lawe min, ma heywan jê ne wiha ne? Hema îro ku bizinek û hespekê xerîb ben gund, ne we bizin here nav pez ba bizinan û hesp jê we here nav hespan.

Însan jê wiha ne! .. Ku ne zaroken gundiyan bixwînin û werin nav me kengê zaroken beg û bajariyan ten nav me?

Welle ez nizamim ji çar salan carke guh û bevilen xwe gire didin û ji bo întbcabe [hilbijartine] di van deran de dibihurin.

De bavo ez çûm jê bi xatire we. Lawo derden me pirr in. Xelk toran di me dikin. Ku îca em wan toran di bejin îşan tînin se-re me.

Dawiya perda diduyan

36

PERDE III

Cî; Dîsa mala Biro ye. We roji Biro neçûye cot, li mal maye. Zîno li ber sili rûniştîye nen çedike. Bedo û Biro nani şikeva û deyv bi çemçikiji

çapeki dixwin.

ZÎNO - Lawo tu îşev li ser xenî rehet razayî?

BEDO - Ere daye ez pirr hej ji xewa li derve dikim.

BÎRO - Keçe ma tu nizanî ser xaniyê me ji wan hundiren bajaran yen bi behn xweştir in.

ZÎNO - De Biro t te tu hiş lo! Ma tu ji ku pe zanî? Ku bi a te be eme tim di nav...

BEDO - Yade qubane dev ji bave min berde.

ZÎNO - Biner lawo neçû cot jî.

BÎRO - Zîno bi sere şex îro ez betilî jî bûm û deste min ji Bedo jî nebû. Mabcerabe ev penc şeş mehe min kengî ez rojeke li mal mame. Lawo Bedo tu dibînî, diya te jî nan bi mala beg re xwariye, haveyne mirwete pe re tûne ye.

ZÎNO - De lawo tu li bave xwe biner. Ev bû sî sale min ku ez gihame, çi cara heye min jî tev li mala beg dike. De biner hema bexte bave te ji vir xuyaye. Be ez feqîra Xwede bi kû de û ma-  
37

la beg bi kû de.

(Biro simbili xweji dew paaij dike û Bedo maçî dike.)

BÎRO - Lawo mirov nema kare henekeke li diya te bike tewer ji wexte ku tu hatiyî, yekcar Zîno har bûye.

ZÎNO - Cima ma min çi kiriye Biro? E tu niha lewik maçî dikî, ne te digot bila nexwîne lo.

BÎRO - De bes le be aqile, keçe ma ji te û wî lawikî pe ve kiye min, çiye min heye dîne?

BEDO - Yade welle min pirr beriya bave xwe kiribû. Rojeke li bajar yek min got qey ew e, heta Deriye Merdine ez bi dû ketim. Min dît ne ew bû ez vegeriyam. Çiqas ez bi ber ketim.



ZÎNO - Ê ez? Qey te beriya min nekiribû?

BEDO - Çawa deka min a xweşik, hîn betir.

BÎRO - Wa! Naxwe "hîn betir" Bedo ha? Bela lawo bela, ez bi te xweş dibim. Be henek heqe diya te li ser me pirr e. Zahf tab dît rebene.

(Bedo çemçiki û nen datîne, devi xwe bi desmalke paqij dike.)

BEDO - Yade welle min ter xwar.

ZÎNO - Wî li min rebene! Tewer min hek ji bîra kirin, de ka ez bînim lawo he?

BEDO - Na welle yade min gelekê ter xwar.

BÎRO - Ta, haa ! Bavo îro Zîno pirr merd bûye.

ZÎNO - De biner ha! Ma kengî min tu birçî hisliye Biro?

BÎRO - De ez qerfa li te dikim le, seheta te xweş aha va min jî ter xwar.

(Biro jî nen û dew ji ber xwe dide alîkî)

BEDO - Noşîcan be yabo.

BÎRO - Bencwedar bî lawo.

ZÎNO - Ere bave te wiha ye le xwarina wî tûne ye. Hindikê dixwe feqîro.

38

BÎRO - Ez dibem hema roviyen min piçûk bûne Zîno.

ZÎNO -r Helbet Biro, ma te rojêke weke xelke ter gepek nane xweş xwar? We sale ez çûm bajar ez li qelewiya bajariyan mam şaş. Pîrek û zilamen wan di vî deriyi re nediçûn. Hûre zike wan wek we keware bûn.

BEDO - Le yade ew qelewî ne baş e. Yek ji wan bajariyen fît fite nikarin bi bave min re gaveke bavejin.

ZÎNO - Ji ku lawo na welle tu tişt di bave te de jî nemaye.

(Biro bi ken, qapanî)

BÎRO - Ez, Zîno! Malnexerabe ez hîn li ser xwe me le! Ev bajarî  
çi ne, ere hûr mezin in le vala ne. Hema hûr' û hew?

(Ro bilind bûye, wexti biriyi ye. Sado û cîranin wan dîsa ten serdana  
wan, ji gava ku lawi wan mekteba xwe xelas kiriye û hatiye  
mali)

BEDO - Yade biner kî hatin?

BÎRO - Zîno merşe raxe, te melkesek li van dera xistiye. .

ZÎNO - Gava din min reş kiribû Biro paqij e.

SADO - Silamûelek.

BÎRO - Elekûmeselam. Kerem bikin ser cil Ape Sado, tu jî cîran,  
hûn jî werin ser cil.

ZÎNO - Bi xêr û ser çavan hûn hatin. Ne ez dibem qey hundir ne  
dû ye. Ah ev kilork ma eze ji ber sele rabim.

SADO - Li kare xwe biner keça min. Le ma cima tu nane xwe bi  
tenûre çenakî?

ZÎNO - Apo, lewik beriya nane sele kiriye û wekî din jî te dît he-  
ma genim bû min fedî kir bibim ser tenûran. Ez tirşiyam min  
go we zarok çav le kevin, nefîsî guneh e.

(Zîno çend nanan li ser hev dike û bi alî mivanan ve direj dike.)

De ez goriya we bim hûne nane germ bixwin.

SADO - Tim hebî lawo. Bi sere Bedo min xwar û ez hatim.

39

KELOS - Bi nave Xwede şekir be ez nikarim bixwim.

SEROXAN - Ku min kariba eze fedî bikim. . .

(Zîno nani xwe dike testi, sela xwe hiltîne, ser sotajî vedimirîne.

Bedo pirr bi kif û ken e.)

BEDO - Xwede kir ku hûn hatin kalo.

SADO - Jixwe eme ben lawo, ma ku em neyen ba te eme herin kû? Gundiyan feqîr he bi qedre te nizariin, ma ku zanibûna we îro bi def û zirne dawet bikirina. Le ma rebenan ji kû zanin, hiş di sere wan de nemaye. Li ber şek û peka bûne wek kerambera rebenan.

REŞO - Ma eme çawa bikin Ape Sado? Mala feqîriye ne ava be, ma ne te digot "Feqîrtî zengara meriva ye."

SADO - Lawo Bedo ji kefa te deste me ji kare me sar bû, îro çiqas îşe me hebû dîsa ez neçûm.

ZÎNO - Te qenc kir Ape Sado, ji evar de tu ji deve lewik neketiyî-

SADO - Biro gerek tu rabî û rûne dua ji Zîno re bikî. Ez zanim be ev yazde sal e çî feqîrtî buhart le îca maşella bû diya efendîkî wek şrekî (Sado li gundiyan vedigere.) Ê zaronê ev efendiye me ne wek efendiye beg û bajara ye. Efendiye neka teşîya Zîno, gîsne Biro û qelema xwe ye.

ZÎNO - Xwede yen aleme giş bihele. Te dît apo min heft kirin bin axa sar, ev maye.

SADO- Lawo Xwede wî ji te re û ji me teva re bihele. Ne tu zanî îca nema lawe te tene ye e me gişa ye, e welet tevde ye. îro kûre welet î bi qeweta Xwede te sibehe bibî bave welet tev de.

REŞO - Ere welle Apo îsal şeş heft sal li Bursaye ez esker bûm, gundek li wir bû nave wî Omerbey bû ma gund bû. Ji bajarekî xweştir bû, min pirsî go zarokek ji vî gundî bûye zilamekî mezin.\* Wî gûnde xwe wiha kiriye.

SADO - Hi, na lawo Reşo ez ne wiha dibejim, ew ji kîs xelke merd in, e me we bi xebata xwe me xelas bike. We feda xwe ne li gûnde xwe tene bike. Nahere, ewen li wan deran min jî

\* Ev gund, gundî Celal Bayar, reise me y( Cumhuriyete i heliye.

li eskeriye dîtin, male millet didizin, li gund, bajar û meriven xwe xerc dikin. Xortên niha pirr baş in Reşo, we roje ez çûm Diyarbekir hema bigre bajar bûye du bendî; yek benda xorta ye ya din jî ya pîr û mîren bere ye ku mîjoyî teba xelke bûne. Îca tewer ew piren çepel ji wan xortên heja re diben qominîst.

KELOS - Qominîst çî ye Apo?

SADO - Ma ez ji kû zanim lawo, hema kî ji ke biqehire ji ye din re dibeje qominîst.

REŞO - Ne zarono tewer min ji we re negot. Ez we roje çûm bajar li ber belediye civaneka benda xelke hebû, xwezî we bidîta eyare mezinan tije pûş kirin. Ma ew xortên ku derdiketin ser masan bi nave Xwede wek ribatan dixwendin. Lo ne dizîya yê bere hiştin, ne hewederya wan hiştin, ne bertîla wan hiştin. Hema hûn yeqîn bikin tiştêkî wan di bin cilike de nehiştin.

BÎRO - Çî çî Sado? Digotin çî, digotin çî?

SADO - De Biro tu fem nakî lo! Ma we ben çî. Digotin e bere hij ji xelke nakin li feda xwe tene digerin, nezan in aqile wan ji dozen niha yê nû nabire, gerek îca deste xweji îşe welet bikşînin. Doza bisperih xortah.

BEDO - Ere kalo li mektebe jî gelek hevalên me yê bajarî û laweh began hene, ew jî ji baven xwe bi gilî ne. Dile wan jî pirr bi gundî û xebatkaran dişewite.

SADO - Helbet we dile wan bi me bişewite, ma ku ew xort zanibin be we xwarina ku li mal dbcwin bi çî taba me diçe ber de-ve wan, ez bawer dikim gepa yekî ji wan di ber wan re naçe.

Maşela niha giş wek milyaketa ne. s

De beje lawo lo be bi xer te dive tu bibî çî?

BEDO - Kalo min sinife liseye fene bi dereca heri qenc qedand.  
Îca niha bave min zane.

SADO - Na lawo bave te ye feqîr ji kû zane. Diya te çetir piçekî  
zane. Le tu ji me teva çetir zanî.

BEDO - Ku ez bim, min ya textori ya mihendizî dive.

BÎRO - Çi? Tu go mihendiz. Na bi Xwede ez qebûl nakim. Ewen  
şewqe mezin ji çî re ne, nikarin li kesî xin û ne kes tiştêkî di-

41

de wan.

SADO - De hûn li aqile Biro binerin kuro, be ma wek van herduwan  
tiştêkî qenc heye? Ya Biro li ser lexistin û bertîle ye. Ku-  
ro beaqilo ma hema mihendiz û textoran bertil e.

ZÎNO - Welle Apo ji bere de i min min textorî dive, ji ber feqîr  
û jar tim ji wan re dua dikin. Dile wan bi ser wan de ye. Apo  
ma naye bîra te, ew textore qenc î li Diyarbekre...

SADO - Çawa lawo ma merive qenc te jibîrkirin.

BÎRO - Biner textor dîsa ji mihendizan çetir in. We sale me li hev  
xist, peşî em birin ba onbaşî û dû re em çûn ba textor. Hema  
be onbaşî û textor gotin çî e din gişa bi ya wan kir.

SADO - De hiş Biro lo, be tu ji kû zanî be tu dibe çî. Onbaşî ku-  
ro, hûn li Biro namînin ecebmayî?

ZÎNO - Ihi Apo bi sere Bedo ev zilam tim wiha ye. Wexta rojeke  
ez ji ber ji xwe re herim bi deveveke de.

SADO - Na lawo bi rastî Biro ne xirab e, ma we çî bike feqîr. Îsal  
çil sal ez nas dikim, bi dû ga de dere û te dîsa bi xera te qîçekî  
şiyar bûye.

ZÎNO - Nahere, ma ez jarek im bi çî zanim.

REŞO - Na welle xwake ne wiha ye, ma em gişik nizanin.

SADO - Bedo lawo ku tu bibi mihendiz te bibî ye çi?

BÎRO - Ma mihendiz giş ne yek in, ewe ku riyan çedikin?

BEDO - Na yabo gelek wene (sikle) mihendiziye hene; y6n riyan yen avahiyan, yen done gaze, yen ave, eletrîke û yen din.

SADO - Min li Stenbole eskerî kir, mihendize gemiyan jî hebûn.

KELOS - De Apo eme çi bikin ji mihendizen gemiyan? Bila bibe yekî ku bi kerî îşe me jî be, ma gemiye me ji kû?

SADO - Bedo lawo talî niyeta te çi ye?

BEDO - Kalo bi rastî dile min bi ser mihendiziyan ve ye.

BÎRO - Haho we bi seqa be?

BEDO - Seqe çi yabo?

SADO - Kuro lawo Biro, ka wek mihendize ave. Bela Bedo bibe mihendiz û be ser Dîcle bend û sikra girede, ave bi vir de û wir de vegeirîne, temame deşta Diyarbekir avî bike, bela tu be seqa. Ev seqa ne ew seqa feqîr ku di bin du teneke av de ditewin.

42

REŞO - Kalo Dîcle hevqas kûr dere, we çawa ava we derxin hemberi deste.

SADO - Lawo Bedo çetir zane, le hema hûn nabînin be mala ji bo birinca xwe çawa sikir dikin taht û nanelin firek bi ser kesî de here, we ew jî wiha be le de îca we ava wî ne ji mala began tene re be, temame feqîren deşta Diyarbekre we di xir û bere de bimînin. Bi van birincen began û caxen me vemirîn, hersal pîreken me giş bi dergûş in le zarok namînin. ew digihen birinca xwe, ta û nesaxî ji me re dimîne.

KELOS - Bi rtêve Xwede we dîsa beg bi fen û futan we car din birinca xwe biçînin û tewer zarok yekcar bi me re namînin.

BEDO - Ape Kelos ma ne we çaxe hikûmet wek niha gundan di

deste began de nanelin.

BÎRO - We hikûmet çî bike Bedo? Hema vî gûnde me kî kare ji mala beg bistîne?

Par lawe Fate dareke tûwe li ber dere xwe çandibû, beg hat dît bi deste xwe avet. Fate giriya û ji beg pirsî be ma cima hilkir.

Beg got, "De her le, dû re sibe lawe te kare beje darek min di vî gundî de heye."

REŞO - Yanî tewer beğen me diben demoqratî.

SEROXAN - Behenek, Ape Sado bege me bere ma ne Xelq bû?

SADO - Çawa lawo, le ji zû de bû demoqrat. E wan ew wiha ne, gep li kû ew li wir. Wek meşan beg tim li demûşe datînin.

BEDO - Yabo we peşî hikûmet gundan ji began bikire. \*

BÎRO - Çî, cima beg gûnden xwe difiroşin?

BEDO - Ne bi deste xwe ne.

SADO - Bise lawo Bedo bise, ew ji te fem nake eze je re bejim.

Dibe we hikûmet wan gundan bi pere xezîne ji beg û axa bikire û we hikûmet bifroşe me. Çawa li bajaran qesr û qûsûra dikire, xera dike û dike re, ew jî wiha ye.

REŞO - Ma Apo ku hikûmet erda bifroşe me eme bi çî bikin?

BEDO - Apo we bi teqşîdan bide me.

BÎRO - îca Bedo ev teqşîd çî ye?

SADO - Bedo lawo ma min negot ew ji te fem nakin.

Kuro teqşîd, qist in, yanî we hikûmet bi deyn bide me, sale eme tişteki bidine heta ku deyne me xelas bibe. Cama ev

43

deyn bîst salan dom dîkin bi vî awayî. Xelk jî dibin xwedî erd. Beg jî digihen heqe xwe.

KELOS - Çî heq Apo. Bi nave Xwede, nîve van xwedîgunda ev

gund bi fen û fûta kirine deste xwe. Giş male dewlete he. Hi-  
kûmet tiştekî nede wan jî ne neheq e. Ma kes male diziye ka-  
re bikire û bifroşe. Hema tu çetir zanî kengî gûnde Serreş,  
Kerbetilî, Berave, Berroje, Reşwane, Ömer, Zivinge, Kûre wek  
adete hatine kirin û firotin? Rehme le be bave min digot ev  
giş bi zore ji xelke hatine standin.

BÎRO - Bavo e min ez yeqîn nakim ku hikûmet gundan ji began  
bistîne bide me. Min sed carî dîtiye beg çiqasî neheq bin on-  
başî û midîr tim hevaltiya wan dikin. îca çawa we tewer gun-  
dan bistînin bidin me? E min ku ez bim textor çetir e.

ZÎNO - Welle bi min jî textori çetir e. Te dît Reşo par keçika we  
bi ve jana reş çû. Ma ku textor heba dimir?

SADO - Tewer min ji bîr kir. Bedo lawo nabejin ew jana reş ji çi  
ye? Careke gotin ji wî genime dermahkirî ye û deng je biri,  
hîn wî genimî didin?

BEDO - Ere kalo ji wî genime dermankirî ye û hîn didin.

SADO - Te dît, çi te sere me ji deste van bega ye. Hikûmet ji bo  
biçînin tov dide wan, ew naçînin difrşin.

Heta tu gundan ji deste wan dernexî kes nikare bi wan. Wekî  
din jî gund cima we ye bajariyan bin. Ma qesr û avahiyan kîjan  
gundî di bajarên de hene, gerek ji gundiyan re be.

BEDO - Kalo min jî rojeke pirsî, digotin hikûmet ji toneke an jî  
ton û nîvî behtir nade kesî. Ev beg çawa sed sedûpencî tonî  
distinin? Li mektebe lawe şexekî hevale min hebû. Digot  
"îsal bave min dused ton genim ji benqe dencist." Çawa di-  
be?

SADO - Rehet e lawo. Began îro nave gundiyan kirine dûvrep û '  
nave mora muxtar jî kirine şeqil.



Jî qewlî wan ve kaxeteke tije nave me dûvrepî dîkin, sere ye- >  
kî ton ton û nîvekî\_ li ser wan dinivisînin û bi mora muxtar~  
bin jî şeqil. Dû re jî feqîran davejin terekto, dibin benqe, ti-,  
liya wan jî li kaxete dixin. Qaşo va ye herkesi genime xwe '  
standin. Le libeke nadin yekî, dîsa wan dîkin terekto tînin  
44

davejin gund û paşe jî xwediye gund wî zadî gişî li ser hev ji  
xwe re difroşin. Bi sere te Bedo ev sed du sed tone ku beg meg  
distînin giş bi van fen û fûta ne.

ZÎNO - Xwede ji wan re nehele rebî!

BÎRO - Tu li aqile Zîno biner Pite welle tişte bi wan naye. Tev  
de li ber Xwede reş bûne, nifir jî nema bi wan ker dîkin.

SADO - Ma de çi di destê me de heye lawo, de rabin kuro destê  
me ji zarowan nabe, le bû dereng.

fMivan radibin, xwediye malijî bi wan re radibin)

,

BEDO - Kalo hîn zû bû cima hûn rabûn? Tu çi xweşik ji me re  
dipeyivî.

SADO - Xwede te bihele lawo ma me feqîran çî xweşik dîtiye ku  
em bejin. Ferza min nave ez behna te teng bikim. Ma yan na  
ev tişte ku îsal hefte sal e min dîtiye ku ez bejim wi ava ce-  
man bisekine.

Dawiya perda sisiyan

45

PERDE IV

Piştî temamkirina lîse, Bedo li Stenboli belaş di Dîcle Talebe Yûrdî .  
de maye û tibbiye xwediye. Bûye textor, tayini Nexwesxana  
Diyarbekir

kirine. Bedo li Diyarbekir maleki kiri kiriye, di û havi xwejî aniye ba xwe.

Temaşgeh: Hiwana mala Zîno ya nû ye. Zîno hiwana xwe wefe ya mala begi xwe ye bere raxistiye. Li herdu aliyan dik danîye. Li navijî masek.

Sibehi bav, law û di bi kefxweşî li dora mase taştî dbcwin.

Ser û Sekeh: Zîno fîstaneke nûyi bajariyan liye, kitanek tenik û çifitkirî di bin guhi wi de ye. Şimikek bajarîjî di lingan de ye.

Biro, riha wî kurkirî ye. Sewaefe li serî ye, destek kinci nû li ye, qutikekî bergirtî bi qerewat liye.

Bedo qutikekî spî û zendik qut li ye, pantorekî paqij û ûtîfeirî le ye.

Ser mase bi tepsikin taştî raxistiye. Zîno çayiji Biro re dbci. Di vî hawayî de perde vedibe.

BÎRO - Bi nave Xvyede Zîno ez ji ve taştîya te aciz bûm. Her sibeh wek roja cejne di nav van tepsikan de ez gejdibim.

46

ZÎNO - Ma eze çi bidim te Biro. Temamen malen bajariyan sibehan van tiştan dixwin.

BÎRO - Bajarî! Ma em bajarî ne? Ka ew dewe sibehan ye cemidî û nane ji keva? Xwezî heba bila qe ceh ba.

ZÎNO - De lawo tu li bave xwe biner. Ma Biro eze nane sele ji ku ji te re bînim. Taştîya began giş ev in, nivîşk e, zeytûn in, penêr e, rical e, çay e, nane fime ye û ew e. Ma ku ne baş bu- na began dixwar.

BÎRO - Hahû dîsa began. Ma Zîno kes bi te nizane. Tu dibe beg ne baş in û tu dibe xwarina wan baş e. Te wek kince wan kiriye. Bere li gund ez çi rehet bûm, kiras û derpiye min î fireh,

li ku ez rûniştama rehet bûm. We ez anîm kirim van kîsikan.  
(Biro pantor û çakiti xwe piş Zîno dike.) Ji ber ku wek e be-  
gan e. Tewer ma ew şal û şape min, ma weke van teng û tehla  
bûn?

Lawo Bedoke min tu bi Xwede kî ne wiha ye?

BEDO (Bi ken û kef) - Ma ez ji kû zanim yabo, welje xebera we  
herduka ye jî.

ZÎNO - Lawo ma eze nane sele û dew ji Biro re ji ku bînim?

BEDO - Yade tu bi Xwede kî hema bave min go çî bila bi ya wî  
be. Çî dixwe çî li xwe dike ew zane. E ku wî necibînin bela  
keça xwe nedin lawe....

ZÎNO - (Bi ken di guhi Bedo de dike piste pist û hidî) Tewer Bedo  
we roje xanima mezin hatibû mala me, heta ku çû me ji te xeber  
dida. Qîza beg Fûge îsal mekteb xelas kiriye.

BÎRO - Lawo va Zîno çawa pîrek e. Kengî ku qala xanima mezin  
dibe dikene û ji me vedişere.

BEDO - Na yabo! Ne tiştêkî heja ye. Yade e min tu îşe min bi Fû-  
ge mûge re tûne. E min ez lawe Eyşo û Fato me, evîna min  
hûn in, nesaxe min in. Ev feqîre tazî ye bekiras ku bi fen û  
fûta ye din çerme îlaşe wan ji wan dîkin. Hûn yeqîn bikin ya-  
de û yabo carna zarokna tînin nexweşxane ji we birîna reş  
heyvane çerm li ser îlaşe wan nemaye. Dibe qey hatine gurandin.  
Ku Fûge mekteba xwe xelas kiribe, bela edî ter û ter ji xwe û  
yen wek xwe, re kincen qumaş û hevrîşim bidrû.

47

ZÎNO - Ema lawo îsal evqas sal xanima mezin li bendî te hişt.

BÎRO - Zîno dîsa xanima mezin.

ZÎNO - De hiş lo be tu bi çî zanî.

BÎRO - Ere welle xebera te ye Zîno, ma ku min bi tiştêkî zanîba min tu tanî?

BEDO - Yade bave min...

ZÎNO - Na lawo ev bave te bûye agir û bi min ketiye. Tim di qirika min de ye.

BÎRO - Derew. Ji xanima mezin û mala beg pe ve kengî ez ketim qirika te, îsal çil sal xanima mezin û mala beg ji guhe min neketin.

(Bedo di ber xwe de û nahile dengi wî here diya wî)

BEDO - Bave min ne neheq e.

ZÎNO De hûn zanin ma min çî je ye.

BÎRO - Çawa te çî je ye, welle te ji hemû tiştî ye.

ZÎNO - Biro e min îşe min bi te tûne. Bedo lawo de ka tu qala wî Yûrde Dîcle ye xwendewaran ku li Stenbole hû ji me re bike.

Ma yen li wir giş wek te xortên feqîr bûn?

BEDO - Ere yade giş xwendekare feqîr yen rojhilatî bûn.

ZÎNO Lawo ew yûrde ke ye?

BEDO - Ne e kesî ye, xwendekare rojhilatî giş li Stenbole dixwînin, wan çekiriye. Kare we gişî xort bi palûtetî diqedînin, belê diyan bajaren rojhilate her yeke tiştêkî ji wan re dişinin û bi vî awayî yurd bi jîn dibe. Le çî fede ev yurde wek ziyareteke niha hatiye girtin.

ZÎNO - Xebînete ma lawo we nikaribû nehişta ku be girtin.

BEDO - Ere welle yade me çend hevalan jî wiha got le çenebû....

BÎRO (Bi qerf û ken) - Ere Zîno xanima te ya mezin jî wiha yurda vedike û zaroken feqîr dide xwendin.

ZÎNO - Tu li Biro binerin kuro! Ma ne te jî heta niha digot xwendin ne baş e.

BÎRO - E min başqe min nizanibû. Le ne ew jî mixenitye dibin dijmîne xwendine. Kesî bi xwendin nadin, yekî feqîr ku bixwîne jî çave xwe berdidine ku bi fen û futan wî jî texin nav

48

xwe. Talî nebû qîzen xwe li ber wan dixin û dîsa tinin nav xwe.

De biner Zîno bi sere bavo îca teqîn li ser sere me ye. Ev fin firta ku li xanima mezin ketiye, ji ba te dernakeve ev doz e. Fûge jî dîsa ev doz e.

ZÎNO - De Biro bes lo! De biner lawo tu dibe qey be min gotiye , Çi-

BÎRO - E min ku bi ya min be keçika mala bire Fermano ji sed Fûgen mûgenê çetir e.

BEDO - Bav û diya delal ma kengî ez ji refe xwe veqetîm. Ma ne gotina me ya peşiya ye, dibejin:

"Her teyrekî bi refe xwe re." Ma ez nizanim peze ku ji keriyê xwe bimîne ya gur dixwe ya diz dibe. Ez laye gundiya me ez laye Biro û Zîno me. Helbet we hevala min jî Xece.be an Zîne be. Em bi ku de Fûgen bi ku de.

BÎRO - Lawo dibejin sibehan çîrok ne baş in. Le de ka ez yeke kinik ji we re bibejim: }

Dibejin rojêke kew û qijik dil ketin hev û rabûn çûn ba Nebî Sileman gotin deka me li hev mar bike. Nebî Sileman ji wan re dibeye: Rabin herin cem çawîşe min, Silemane Dunikul, îşe mare di destê wî de ye. Ku ew kef bike bila mara we li hev bibire.

Dibejin li ser ve yeke kew û qijik bi kef radibin û derin cem Silemane Dunikul û doza xweje re vedikin le nakeve sere wî.

Çiqas şîret li wan kirin, go nabe, le neket sere wan û nig li ser

danîn.

Rabû Silemane Dunikul ji wan re got:

- De biner hûn wî xirame han dibinin, de bifirin herin li ser wî deynin û mesekinin werin. Eze tilî ji we re bejim.

Herdûkan yanî kew û qijike bi kef li xwe xistin firiyan. Qijike dom kir çû li sere xirem danî û di cî de vegeriya hat ba Silemane Dunikul, le kewa feqîr hîn li bi gura li nîve re maye. Û pişti mişvarekî kew jî behn çikiyayî betilî û xwedandayî bi helke helk hat cem wan û got:

-Ah wa ez hatim.

- Ah wa ez hatim.

49

Wekî ku got 'Ah wa ez hatim' Silemane Dunikul î aqilmend le vegerand

û got:

- De rabin her kesekî herin nav refe xwe. Ji ber ku firra we nabe yek, ez nikarim mara we li hev bibirim.

ZÎNO - Te bave xwe dît lawo, ji tiştên ku bi dile wî be be çi bi aqil e. Ji min rebene tene re be aqil û xerab e.

BÎRO - Keçe Zîno ma min çi kiriye ji te? Çil salî em ji xelke re xebitîn ma aqil di sere me de ma. Carna bi mehan min ji herdu gaye cot pe ve rûwe kesî nedidît. Min xeberdan ji bîr dikirin.

Ji "ho ho û xet yabo xet" pe ve deve min nediçû ser tiştên tekî din. Ma naye bîra te wexte şevîna ku temame buhare xew nediket çave min? Bi rojan ez nedihatim mal. Careke ez hatim mal ku va ye ew lawike me ye dûr be ji Bedo mezintir, miriye. We veşartibû jî min nedît û nebihîst.

(Zîne navi ku Biro rojen çûyî bîne bîra wan. Çayiji wan rerû di-

ke û çavi wi hinefet bi girî ne. Bedo diçe rûyi diya xwe, Biro di bin simbilan de dikene.)

ZÎNO - De bes Biro lo, tim tu ev î. Ma em çawa bikin. Bela Bedoke min sax be.

BÎRO - Ere welle Zîno gotina te ye.

BEDO (Bi ken) - Maşella ez dinerim gotina we bû yek.

ZÎNO (bifedî) - Na lawo, ma eze çi bikim bave te ye.

BÎRO (Bi ken û simbeli xwe paajj difee) - Ere bavo, tewer Zîno mineta

jî li lawe min dike.

BEDO - Ma yabo diya min ne heja ye minetan.

ZÎNO - Mineta çi lawo îşe bave te.

(Taştiya wan xelas bûye, Zîno şifre dide hev. Bedo alî diya xwe di-ke Biro çixara xwe pi xistiye. Di we navi de deriyi wan î hewşî vedibe, pîrekek gundîfeqîr û kurikekî bijana birîna reş li pişti dikevin deri û ti bi ali eywani ve. Navi we Xensi ye)

XENSE - Mala textor vir e efendî?

BEDO - Ere daye ev e.

50

XENSE - De ka lawo bi xera xwe bang ke textor.

BEDO - Beje yade textor ez im.

XENSE - De lawo dev ji min feqîre berde kuro. Ma ez a tinaza me. Tu dineri lawike min nesax e. .

BEDO - Çi tinaz xwake, bi rastî textor ez im. Cima tu bawer nakî.

XENSE - Pepû ma textore Kurmanc hene keke?

BEDO - Hene ya va me ez.

XENSE - Le bave min digotin textorekî pîrr xurt û mezin e.

BEDO - Hema çi gotibin ez im. Metirs!

XENSE - Mala Xwede sed carî ava, îcar textor ji me jî çe dibin.  
(Lawiki Xensi hîn li pişta we ye. Ji kifa şaş bûye. Ji aliyekî dua dikeji alîyekî hema diçe û ti, ji xwe re xeber dide. Jîna Zîno ya be-ri wek şîrîta sinemi ti ber çavi wi û bi kul û ken û girî li wan diferice.)

ZÎNO - Ere keça min ere, çawa textore kurmanc tûne ne. Kî di mekteban keve û bixwîne dibe her tişt. Kurmanc be çi be wek hev e. Ke ji te re gotiye Kurmanc nabin tiştêk. Nîve mamura giş Kurmanc in, le newerin rebenan xwe le nakin xwedî lawo.

XENSE - Bele welle yade, we sale hikûmet hat ku li gûnde me mektebeke çekin, bege xwediye gund hat û nehişt û li peş me gişa got: "Kurmanc nabin tiştêk we çi bikin ji mektebe"

BEDO - Na xwişke na, ew giş derewan dikan.

XENSE - De bila lawe min bila ez bi goriya te bim.

ZÎNO - Ma lawo te xer e?

XENSE - Xer li te be yade. Welle min lawike xwe anî ser textor.

BÎRO - De Zîno we jinik li ser nigan hişk kir ka bila rûne.

ZÎNO - Ere welle Biro gotina te ye. De keça min ka were rûne, lawike xwe vek.

(Xensi bifedî û tirs zaroka xwe ji pişta xwe datîne û li Bedo dinere)

51

XENSE - De ez bi goriya we gişan bim rebî.

(Bedo diçe cem wan û radihije desti lawike nesax, giş di nav paçik û qerpalan de bûye wek çelîkekî meymûni.. Laşi wî ji birîna reş qelişiyê.)

BEDO - Ev lawike spehî nesax e? De ka ez bibînim. Na na metirs, ez keke te me lawo, ka destike xwe ye xweşik kurike



min. Maşella gelekî baş e. Sibehe werin nexweşxane we zû sax bibe însellah.

XENSE - Na welle textor efendi. Ez bi ser te bigerim. min dive tu li vir wî derman bikî. Bi sere te min çar kirin bin axe, ev maye. Diben li nexweşxane guh nadin jaran.

BEDO - Na xwişke na, derew e nexweşxane jixvye ciye jara ye. Li wir jî dîsa ez im.

ZÎNO - Lawo gotina Xense ye. Ma giş wek te ne? Jar ji vî awayî ji nexweşxana çavtirsandî bûne.

XENSE - Biner textor efendî ez ne destvala hatime ha! Bi sere te û vî lawike tene ji bihare de ez heka difiroşim û mirişkeke min jî ji hekan qut bû, min ew jî firot da bi deh mecîdiyan. Hema tev de nozdeh kaxet kirin.

Dudo besî nan û buhaye xana min û kerika min e. £ din jî ji te re. Bila lawike me sax bibe bila giş here.

BEDO - Na xwake na, min pere te naven le eze lawe te sax bikim.

XENSE - Tew qey tu dibe hindik in. Ma ez rebena Xwede eze çî bikim. Ere welle ne pirr in ev pere, le de îca ji Xwede xuyaye tunene. Mala feqîrtiye ne ava be. Dibe "Feqîrtî zengara meriva ye." £ de ne we nedîtiye. Le feqîrtî pirr zor e, kes nebîne.

(Dîsajîna Zîno ya beri ti ber çavi wi. Desmala xwe dertîne û pi hisirin xwe vedimale.)

ZÎNO - Na lawo tu bawer bike ne ji hindikatî ye. Tişteke neye ber dile te, jixwe pera nastîhe.

XENSE - Rebî Xwede min bi goriya sere te ke lawo. Mete textor

52

çî te ye?

ZÎNO - Laye min e.

XENSE - Rebî Xwede ji te û me gişkan re bihele. De ka em herin eze lewik sibe bînim nexweşxane.

BEDO - Hûne îşev herin ku xwake?

XENSE - Tu sax bî qûnaxa min heye, min du mecîdî dan ye ber xane yek ji bo min yek ji bo kerika min.

BEDO - Çi çi xan! Ev lawike nesax çawa te bibî xane?

XENSE - Ma ez çawa bikim lawe min li bajaran qûnaxen me feqîra xan in. (Bedo hidî bi diya xwe re xeber dide.)

BEDO - Yade de ka bila îşev ben mala me le.

ZÎNO - Behenek keça min de ka îşev ben ba me lawo.

XENSE - We çawa be ez bi goriya sere te û wî bim. Ne yade kerika me li xane ye he.

ZÎNO - Ma çi bûye lawo, here guh bide kera xwe ji ye ber xan re beje û were.

XENSE (Silo di nav paçik û maçikan de dipiçe) - De rab Silo wer pişta min ku em herin.

ZÎNO - Nave te çi ye keça min?

XENSE - Xense ye xatûn.

ZÎNO - Ê de Xensê keça min te dive lewik nebe te zûtir be.

XENSE - He ere welle xatûn xan jî dûr e.

De rûne Silo lawo negrî. Eze niha bem, eze ji te re ji r nane genimî binim.

SÎLO - Yade ji textor ditirsim ez jî bem.

XENSE - Metirs lawo textor gelekî baş e ew jî ji me ye.

SÎLO - Te zû be yade?

XENSE - Niha eze bem rûne ji xwe re bilîze. Ez wek peza qurbane bi ser sere te û wî bigerim. (Xensi desti xwe bi alî ezmen

de vedike û dua dike) Mala Xwede sed hezar cari ava ji van rojan re. Em li yekî ku ji zimane me fem dike rast hatin. BEDO (Kursiyi xwe tine nizî Silo ûpişa dibe) - Ê lawike xweşik nave te çi ye?

(Pişifedî dike û bere xweji textor diguhere.)

53

BEDO - De lawo nave te çi ye? Ez ape te me.

SÎLO - Silo ye.

BEDO - Ê Silo ka ma bave te tûne?

SÎLO - Cima tûne, xulame mala beg e.

BEDO - Hi.. Xulame mala Beg. Ere ma we çi be feqîr? Silo ma te şekir nave?

(Textor çengek şekiri sor dide Silo.)

SÎLO (Silo li desti textor dinere û bi herdu destan devi xwe digre)

- Na, na welle ev ne şekir e, derman e.

BEDO - Metirse lawo bi sere te şekir e, biner çi xweş e.

SÎLO - Na, na yabo ma şekir wiha ye?

BEDO - Le ma şekir çawa ye Silo?

SÎLO - Welle min şekir li mala beg dît spî bû.

(Vica textor çend şefeiren çayijî tine û pişi Silo dike.)

BEDO - Ev bû Silo?

SÎLO - Ere welle wek wî bû.

BEDO - Gotina te ye Silo le biner ev jî şekir e. De ka were em bi hev re bixwin he?

(Pişi textor qursikek şekiri sor û kabikek şekiri spî dixwe, Silojî dixwe.)

SÎLO - Wey! Ere welle serîn e. (0 şekiri ku di desti textor de maye giş direvîne dbce paşela xwe.)

BEDO - De bixwe Siloke xweşik.

SÎLO - Na welle xebînet e eze bibim mal ji bave xwe re.

ZÎNO (Bi melûlî li wan diferice.) - Silo lawo ma xwişk û birayen te tunehe?

SÎLO - Çawa, du bire min û se xwişken min hebûn giş bi ve jane mirin, mam ez tene.

BEDO - Silo tu v jî naxwî?

SÎLO - Ma ew çi ye?

54

BEDO - Pirteqal e.

SÎLO - Pirteqal çi ye? Na welle şemamok e.

BEDO - Bila Silo de ka bixwe.

SÎLO - Na welle ez naxwim. Eze ji xwe re pe bilîzim. Ma şemamok ten xwarin?

BEDO (Bi derd û di ber xwe de) - Ere. Silo xwarina xelke lîstika te ye. Hîn tu xwarina wan nas nakî.

ZÎNO - Bedo lawo qey te gelekî hej ji Silo kir?

BEDO - Ma çawa eze hej je nekim yade. Ev çelîke insana ku bûye lepek hestiye be çerm, ma çi nayîne bîra min. Çi ferqa wi û welate min ji hev heye? Feqîr, tazî, nesax û ğurandî. Yade ma min cima xwend? Cima Yûrde Dîcle ez dam xwendin? Ma ji bo ku ez jî di nav van qesaban kevim an hij ji Silo bikim û wî ji vî halî xelas bikim?.

ZÎNO - Bele lawo bele. Xwede te bihele. Ma çawa te hej ji Silo nekî? Ez bi te xweş dibim. Ma bire te giş ne di vî halî de mirin çûn, mala mine!

BEDO - Tu piştrast bî yade. Ere îro yekşem e le nexweşen min hîna li bendî min in. Ez nasekinim eze bem. Silo tu jî negri

şekire xwe bixwe heta tem ji xwe re bilîze. Û biner tu negri ha!

SÎLO - De her le biner zû were, yan na eze bigrîm.

BEDO - Ser çave min Silo.

(Bedo çakiti xwe li xwe dike, çenti xwe digre û diçe. Zînojî bi dû lawi xwe de dinire û digrî. Li giriya xwe piş Silo nade.)

ZÎNO - Ê Silo lawo de beje ma tu ne birçî yî?

SÎLO - Na min xwar.

ZÎNO - Te çî xwar Silo?

SÎLO - Diya min ji min re nane genimî kirî.

ZÎNO - Û çî din lawo?

SÎLO - Ma ne bes e.. We çî din ji min re bikire?

ZÎNO (Xwarini dike tepsiki û datîne ber Silo) - Silo lawo de ka dîsa bixwe lawo!

55

(Silo şifre dide tenişta xwe)

SÎLO - Na welle ez naxwim eze ji diya xwe re hilînim.

ZÎNO (Ji alîyekî de hestiren çave xwe pakij dike ji aliye din li ber Silo diğere ku bbcwe)

- De tu niha bixwe ji diya te re jî heye lawo.

(Zîno dîsa sifri dikşine ber Silo, Silo li tiştên ser tepsiyi dinire li tiştêkî ji nas nake.)

SÎLO - Ma ev dims e?

ZÎNÖ - Na lawo rîçal e.

SÎLO - Wey ev jî şekir e ma çiqas şekire we heye. Ma ev çî qaşil di nav de ne?

ZÎNO - Ne qaşil in, mişmiş in lawo.

SÎLO (Radiheje pener li dinire û di cî de datîne) - Na welle ez

toraqş (jajî) naxwim.

ZÎNO - Ne toraq e Siloke xweşik, pener e.

SÎLO - Qey çortan e. Diya min jî ji nav gund dew ji me re tîne û  
çe dike.

(Ji bo ku Silo necifile, Zîno li zor nake û bi ya wî dike. Silo li zeytûnanji  
dinere li nas nake. Yeki dike devi xwe li mucwe, davije er-  
di.)

ZÎNO - Zeylûn in lawo de bixwe kûre min.

SÎLO - Na yade welle heshesuke telî pis in, ez naxwim.

ZÎNO - De tu zanî Silo. Ma tu goşt jî naxwî?

SÎLO - Ere welle ev goşt e. Par roja cejne min li mala keye  
xwaribû. (û bi destan radihije parîk goşt û dixwe.)

ZÎNO - De bixwe lawo bixwe, ma te av nave?

SÎLO - Bele.

(Zîno qedehek av tîne ji Silo re. Silo bi herdu desten tazî û birini  
radihije qedehi û li dinere.)

56

- Ava we çi spî ye. Qey ev jî ne av e şekir e?

ZÎNO - Na lawo na av e ma ava we ne wiha ye?

SÎLO - Ji ku, diya min ji bîre tîne, tevde girik e û emi ne di tişte  
wiha biroqankî de vedixwin.

(Li şerqi qutîki ku Emerîqanî xwarina xwe ji dixwin û davijin,  
paşi xelkifeqîr çembilan bi wan tenekan ve dikan û pi avivedixwin;  
li bajaran tin firotin. Min li Diyarbekir û Rihayi li âikanan ditin.)

(Di vi navi de xortek ti hundir ûji Zîno dipirse.)

XORT - Xatûn mala textor ne ev e?

ZÎNO - Bele lawo ev e cima?

XORT - Çend xelke gundan le dipirsin, nesaxe wan hene. Nave

wî li deri nenivîsandiye. Bi ser venabin.

ZÎNO - Lawo ne li mal bi pera li nesaxa nahere. îşe wî li nexweşxane ye. Ji ber ve yeke wek textoren din nave xwe li ser dert naxe. Le de ka bela ben hundir lawo. (Gundî û nexweşin xwe tin hundir Zîno wan nas dike gundiyan wi yen beri ne.)

ZÎNO - Pepû Gûle hûn in xwake, we xir e.

GULÊ - Ma me çî xer e yade. Me Memo. anî ser textor.

ZÎNO (Li lawike Guli yi li nav lihifi dinere) - Jare ev Memo ketiye vî halî!..

GULÊ (Bi girî) - Tew yade ma te yen din bidîtana, tewer hema ev hîn can te heye. Her se yen din mirin. ew zaroka ku te ewqasî hej je fikir jî mir.

ZÎNO - Cima tu mayî heta niha gidî?

BUHARÊ - (Xwa Guli ye pi re hatiye) Xwa Zîno te dît deste me vala bû. Me got şerm e.

ZÎNO - De tu li Buhare binere. Keçe ma ne şerm e tu wiha dibejî? Ma we Bedo bi peran li we binere. De biner lawik nebihîze ha.

GULÊ - De xwake bajar e tu bikî nekî pere lazim in. Em nû hatin bajar, yekî qoçanek da me û du mecîdî ji me standin. Em çûn xane ew jî wiha.

ZÎNO - Gûle xwake ma ne şerm e ku mala me hebe tu heri xane?

BUHARfi - Wî li min xwa Zîno, bi vî halî em û mala we û textor?

57

ZÎNO - Na here Buhare. Na bi sere Bedo ew betir mevanan dive. (Silo piş wan dike) Biner beri niha diya vî lawikî jî hat. Li vir hişt, nehişt ku here xane.

(Biro ji derve ti pîrek wî dibinin)

BUHARÊ - Xwa Zîno va keke Biro hat.

BÎRO - Hûn bi xer hatine zaronu. (Li lawiki nesax dinire) Wey mala mine ev Memo ye wiha bûye?

GULÊ - Ere keke ma tu nabejê ka yen din?

BÎRO - De bela ye mayi sax be. Ma ka cima Xelo nehat?

BUHARÊ - Ma karîbû keke wexte cotan bû, keye nehişt.

BIDO - Ere welle wiha ye. Nahele. De ser çava hûn hatin.

(Wi çaxi diya Silo difeeve derî)

ZÎNO - Wer lawo Xense, biner be ez û Silo em çiqasî bûn dost.

XENSÊ - Xulame te ye xatûn. Xwede bike tu aciz nekiribe?

SÎLO - Na welle yade ez negiriyam. (Kulmefe şekir ji paşela xwe dertîne û dide diya xwe.)

Biner be textor çî da min. Min jê ji te û bave xwe re hilanê.

Yade vir ji mala me pirr xweştir e yade. Tişt giş le hene. Biner

şekir, şimamok û goşt û yen din. Tewer ava wan be çî xweş

e. Yade hemî spî ye û qerisî ye.

XENSÊ - De bila lawo bila Xwede zede bike. Aha va textpr jê hat.

BEDO - O maşela civata diya min gihaye hev.

ZÎNO - Lawo Bedo te nas kirin metika te Gûle û Buhare ye.

BEDO - Ere yade min nas kirin hûn bi xer hatin ma xer e mete?

GULÊ - Ma me çî xer e lawo. Em tev de qeliyan zarok bi me ve

neman. Min Memo aniyê ser te, de biner be Meme min ketiyê

çî hesîrtiyê.

(Bedo çenti xwe daiîne, bi kul û keser radihije desti Memo û des-

ti xwe yî din jê ser seri Silo. Biro, Zîno û diyên zarokan giş li wan

ânirin.)

58

BEDO - Ere zarokno!.. Em qeliyan. Le îca em naqelin.

Dawiya perda çaran



59

birîna reş

MUSA ANTER BÛTÛN ESERLER/ 3 ° Kara Yara

AVESTA YAYINLARI: 56

Musa Anter Bûtûn Eserleri: 3

Kara Yara

Editör: Abdullah Keskin

Kapak: Ahmet Naci Fırat

Dizgi ve Mizanpaj: Avesta

Birinci Baskı: 1965

İkinci Baskı: 1991

Ûçûncû Baskı: 1999, İstanbul

Baskı: Gûlen Ofset

© Avesta Yayınlan, 1999

Tanıtım amacıyla yapılacak alıntılar dışında  
yayınevinin izni alınmadan hiçbir şekilde çoğaltılamaz

AVESTA BASİN YAYİN "

REKLAM TANİTİM MÛZtK DAĞİTİM LTD. ŞTİ.

Aşmalı Mescit Sokak

Şahin Han 35 / 403

Beyoğlu / İstanbul

Tel-Faks: (0212) 251 71 39

ŞUBE

İstasyon Caddesi, K. İsmail Paşa 2. Sokak

Abdi Paşa Apt. Giriş Katı

OFİS /DİYARBAKIR

Telr-Fax: (0412) 222 64 91

ISBN: 975-7112-65-8

Musa Anter

Kara Yara

avesta

MUSA ANTER: "Tûrkiye'nin 55 yıllık girdisinin, çıktısının, yeminli, canlı bir şahidi-

yim. 'Hem yalnız şahidi mi?' Değil!.. Saniğiyım, mahkumuyum ve davacısıyım" di-

yen Musa Anter, 1918 yılında Mardin'in Nusaybin ilçesine bağlı Zivingi köyünde

doğdu. İstanbul Üniversitesi Hukuk Fakültesi'ni bitiren Anter, 1959da 49'lar ve Dev-

rimci Doğu Kültür Ocakları (DDKO) davalarında yargılandı. Amer 27 Mayıs darbesi

yapıldığı sırada gözaltındaydı. 12 Mart ve 12 Eylül askeri darbelerinden sonra da gö-

zaltına alındı. Musa Anter, 20 Eylül 1992 günû Diyarbakır'da katledildi. Dicle Kayna-

ğı, Şark Postası, Heri Yurt, Barış Dûnyası, Deng, Yeni Ülke, Welat, Rewşen ve Tewlo

isimli gazete ve dergilerde yazılan yayımlanan Anter, Özgür Gündem gazetesinin kö-

'şe yazanydı. "Hatıralarım" ve "Vakayiname" adlı Tûrkçe eserlerinin yanında "Birîna

Reş" ve "Kımıl" adlı edebi kitaptan da bulunan Musa Anter, cezaevindeyken Kûrtçe

sözlûk hazırlamıştı. Halkın Emek Panisi'nin (HEP) kurucu üyesi olan Anter, merke-

zi istanbul'da bulunan Kûrt Ensîitûsû'nûn başkanlığını da yûrûtüyordu.

Avesta, Musa Anter'in bûtûn çalıřmalanm kitaplařtınyor. Kitaplan basımı bittikten

sonra Anter'in yazdıklanndan örneklerin, biyografisinin, onunla ilgili yazılann ve

fotoğrafların yer aldıđı bir "armağann kitap" yayımlanacaktır.

Arřivlerinde Musa

Anter'e iliřkin yazı, belge ve fotoğraf bulunanlann, bu dökûmanlann birer kopyasını,

. fotoğrafsa iade edilmek üzere orijinalini İstanbul ya da Diyarbakır adresimize gön-

dermelerini rica ediyoruz. Katlalannız için řimdiden teřekkûrler...

BİRÎNA REŞ VE MUSA ANTER

Musa Anter'in Birîna Reş (Kara Yara) oyunu 1965 yılında yayımlandı Kitabın ikinci sayfasında yazar řöyle diyor: "Bu eseri 1959'da İstanbul Harbiyesinde 38 nolu hûcrede tutuklu iken yazdım."

Eserin yazıldıđı yılları bir hatırlayalım; o yıllarda tûm Kûrt direniřleri (1925, 28, 30, 36, 38, 41, 42...) bastırılmıř, Kûrtler sonu gelmez bir baskının cenderesine sıkıřtırılmıřtı. Kûrtlerin yařadıđıa topraklardan dinmeyen bir yangının dumanları yûkseliyordu. Korku, gûvensizlik, (ediginlife her yere herřeye egemen hale gelmiřti. Yûzlerce, binlerce Kûrt aydını, řahsiyeti öldûrûlmûř, ûlkeden uzaklařtırılmıř ya da sindirilmıřti. Kûrt dili ve Kûrt diliyle iliřkisi olan herřey yasaklanmıřtı. Kederli Kûrtler sonu gelmez bir yasa bođulmuřtu. Harabe haline getirilmıř ûlke ađlıyor, fukaralık ve çaresizlik Kûrt insanını bođuyordu.

Böylesine zor řartlarda, "Ben Kûrdûm" demek bile bařlı bařına

bir olaydı. Musa Anter oyununu bu çok zor şartlarda yazdı, üstelik askeri zindanlarda.

Edebi eserlerin anlam ve önemleri yazıldıkları dönemin özellikleriyle çok bağlantılıdır. Kimi dönemlerde bir sözcük, bir cümle bile yazabilmek neredeyse bir devrimdir; en onurlu işidir. Kimi dönemler-

de ise ciltler dolusu eser pek önemli olmayabiliyor. Musa Anter'in Bi-

rîna Reş isimli eserini çok önemli ve ölümsüz yapan, yazıldığı dönemin özellikleridir. Kimsenin "Ben Kûrdûm" diyemediği, Kûrtçe bir cümle bile yazamadığı o çok kötû dönemde Anter güzel ve anlamlı bir piyesi Kûrtçe yazdı.

Yanılmıyorsam Birîna Reş, Cumhuriyet'in kurulmasından (1923) sonra Tûrkiye'de yayımlanan ilfe Kûrtçe eserdir. Kimi zamanlar Kimi şiir dizelerinin, destan parçalarının yer yer yayımlandığını biliyoruz. Ama Birîna Reş kitap olarak Kûrtçe yazılıp yayımlanan ilk eserdir. Bu özelliğiyle eser Kûrt dili ve edebiyatı tarihinde önemli bir yere sahiptir.

öteki ulusların entellefetûel ve kûltûrel deneylerinden biliyoruz; aydın insan yeni adımlar atan, yol açan, yol gösteren insandır Yeni yollar açıldığında yolun nasıl katedileceğiyle ilgili bilgi oluştuğunda o yollarda yûrûyecekler hep fazla olur. Ancak en önemlisi kuşkusuz, yolu açabilmektir Tûni olumsuzluklara, zorluklara rağmen gerekli zorunlu ve kaliteli eserler yaratabilmektir. Musa Anter ve eseri bu zorlu ama bir o kadar da onurlu işin en iyi örneğidir.

Anter kısa önsözünde şöyle diyor; "Doğu'da Kara Yaralar çoktur. Örneğin trahoma, verem, cûzam ve bûtûn bu hastalıkların anası olan fakirlik ve cehalet gibi..."

Anter'in oyunu tûm bu 'kara yaraların' ilacı gibidir Ûlkeler, halklar için en amansız kara yara elbette fakirlik ve cehalettir. Onları devamlı kemiren, tutsak haline getiren, gelişmelerini önleyen bu

yaradır. Fakirlik ve cehaletin ilacı ise uygarlığın, eğitimin okuma ve yazmanın, devamlı ışıldayan aydınlığıdır Anter, oyununu aydınlığı hedefleyerek kurmuş. Gûzel ve akıcı bir dille Kûrt toplumundaki fukaralık ve cehaleti tasvir ediyor. Zorava köyû, Zino ve Biro'nun yaşamı, ailevi ilişkileri Kûrt toplumundaki biçareliğin örnekleridir Öte yandan Zino ve Biro'nun oğlu Bedo yazarın amaçladığı aydınlığı simgelemefetedir. Oyunun ana karakteri olan Bedo, Kûrtlerin geleceğe ilişkin umududur. Bedo okuyarak doktor oluyor ve Kûrt insanının yaralarını sağıaltmaya başlıyor Tûm "Kara Yaraların" ilacı haline geliyor. -

Musa Anter'i ilk kez 19'/1 'de Diyarbakır askeri cezaevinde göryazabilmek gördûm.

Anter'in o zaman bende bıraktığı ilk duygu şuydu; ûzûntû.

Ona ve durumuna ûzûlmûştûm... O zamanlar ben 18 yaşlarında bir genç, o 55 yaşlarında bir "apo" yani amcaydı. Saçları çoktan ağarmıştı, gençliğini, orta yaş yıllarını geride bırakıp yaşlılığa doğru yol alıyordu. Onu daha yakından tanımaya başladığımda tûmûyle yanıldığımı anladım. Anter, kesinlikle insanın ûzûlmesi gereken birisi değildi. Tersine o insana umut ve direnç aşıyordu. Sözleri, hareket-

leri ve yaptıklarıyla tûm cezaevine bir umut, bir gûven, bir sıcaklık veriyordu. Korku, kuşku ve tedirginliğin mekanı olan cezaevini neredeyse bir panayır yerine çevirmişti. Cezaevi, onun için, bir eğitim

öğretim, eğlence ve keyif mekanı olmuştu. Ūzgûn, tedirgin tutuklu-  
lar Anter'in yanına gidiyor, onun şakaları, öğütleri bitmez tûkenmez  
öykûleri ve gûzel belagatıyla cezaevinin kasvetini ûzerlerinden atı-  
yorlardı. Birîna Reş'in yazarı cezaevinde de oyununda anlattığı  
amaçların, hedeflerin peşindeydi.

Birîna Reş, Kûrt edebiyat tarihinde onurlu bir yere sahiptir.

Oyunun gerisindeki çaba, amaç ve arzu önemlidir. Kûrtlerin bunla-  
rı bilmesinde bûyûk yarar vardır. Bu nedenle Musa Anter kesinlikle  
unutulmamalı, kitaplarının devamlı yeni baskıları yapılarak okuyu-  
cuya sunulmalıdır.

Mehmed Uzun

Aziz okurlarım

Bu eseri 1959'da İstanbul Harbiyesinde 38 No'lu hûcrede tutuk-  
lu iken yazdım.

Vak'anın mûhim bir kısmı, kendi hayat hifeayemdir

Doğuda "Kara Yara"lar çoktur. Örneğin:

Trahom, verem, cûzam ve bûtûn bu hastalıkların anası olan fakir-  
lik ve cehalet gibi.

Bu piyesin konusu olan "Kara Yara" hastalığı ve diğere "Kara Yara"  
lar hakkındaki fikir ve mûşahedelerimi, piyeste bulacaksınız.

Musa Anter

24 Ocak 1965

Suadiye

OYUN

KİŞİLER

ZİNO

BİRO

ZERO

MISTO  
BEDO  
SADO AMCA  
SEROHAN  
KELOS  
REŞO  
HANSE  
SİLO  
GENÇ  
GÛLE  
BUHARE  
BİRİNCİ PERDE

Oluş yeri: Diyarbakır etrafında Zarova adlı beylere ait bir köy.  
Sahne: Bu köyde beylere ortaklıkla çalışan fakir Biro'nun evi. Ev yani sahne şöyle döşenmiştir: Ev; tek bir odadır. Çamurla bölünmüş, bir kısmı ahırdır. Oda loş ve kirlidir. Dışarıdan yer yer tezek topak^ lan yapıştırılmıştır. Eski, yarıya kadar arpa unu dolu bir çuval duvara dayalıdır. Birkaç şilte, yırtık pırtık yorgan ve birkaç yamalı patlak kepek yastık, gömme dolapta yığılı. Kıldan ve yırtık bir çul da, yatakların üstünde: Yamalı ve kalaysız bir tencere ve leğen, kırık bir elek, ağaçtan kırık bir kepçe, ağzı kırık bir su testisi ve tavukların su içtiği bir çanak da kapının önünde. Eşeğin dağınık paraları da sundurmaya dayalıdır. Biro'nun karısı Zino çuvalın önünde leğene un eliyor. Zino 8 doğum yapmış fakru zarurette bir deri bir kemik kalmıştır 45 yaşındadır, fakat 70'lik bir nine gibi çökmüşdür. İki omuzu yırtık yavan bir basma entari giymiştir. Önünde yırtık bir peştemal vardır. Beline eski bir kupak bağlamıştır Başına yırtık bir namazlık örtmüşdür, üstünde de bütûn Diyarbakır köylü kadınları

gibi fco/î vardır

Bu esnada elinde çift asası, omuzunda sapan demiri ve boyun-  
duruđu asılı yorgun argın Biro çiftten gelir. Biro asasını köşeye da-  
15

yar, omuzundakileri de palanın yanına bırakır Zino'nun eli hamur-  
da olduđu için Biro kendine çulu serer, bir yastık ûzerine kor ve otu-  
rur. Biro da elli yaşındadır fakat o da yaşından çok bûyûk görûn-  
mektedir. Gûneşten yanmıştır. Amerikan bezinden bir entari ve  
uzun

don giymiştir. Yırtık basmadan bir gömlek sırtındadır.

Başında yamalı ve siperi kırık ters giyilmiş bir kasket vardır. Sa-  
kalı gelmiştir, her haliyle pejmûrdedir.

Birinci Dûnya Savaşında Zino'nun babası askere gitmiş ve gelme-  
miştir. Birkaç sene sonra annesi de ölûnce köy sahipleri Zino'yu ev-  
lerine hizmetçi almıştır. Daha o zaman Zino demişti ki, "Eđer bir  
gûn benim de çocuđum olursa, beygilinkiler gibi ben de okutaca-  
đım." Zino evlendi, 8 çocuđu oldu, yedisi öldû, tek kalan ođlu  
Bedo'yu

da okula göndermiş, o sene Diyarbakır Lisesini bitirecekti.

ZİNO - Haydi Biro, elim hamurdur, kendine çulu ser.

BİRO - Pekî Zino.

ZİNO - Ne yapalım Biro, biraz önce geldim. Bir yudum ayran  
için her gûn öğlelere kadar bu ak saçlarımla elin gûbresini si-  
lip sûpûrûyorum.

BİRO - Ya ben Zino, ama ne yapabiliriz? Sahi Bedo'nun mektu-  
bunu okutmadın mı?

ZİNO - Ay, unuttuydum, nasıl okutmadım. Kahya okudu, ođlum  
okulunu bitirmiş, hayırlısı yakında geliyormuş. Gördûn mû



Biro sen okumasın diyordun.

BİRO - Aman sanki oğlu okudu da ne olacak? Hem biliyor musun Zino, sen bu çocuğu bozdun. Onun arkadaşları bu on senedir, kendilerine çobanlık ediyorlar. Bugûn Selo'nun oğlu Reco, on keçiyi beğenmiyor. Sen hâlâ okulu tutturmuşsun. Keşke o beş seneyi de beyin evinde hizmetçi olarak geçirmeseydin de, şu okul lafını öğrenmeyeydin.

ZİNO - Evet Biro. Yazıklar olsun seninle geçen boş hayatıma. Sen bana bak, kendine bak. Bu otuz senedir senle evliyim, bir gûn bana bir entari, bir ûç etek aldın mı? Hayır. Bûtûn sene esirler gibi çalışıyoruz, yine bir kann toksak, bir kann da açız. Daha beygil uykuda iken onlara hazırladığımız kahvaltılarının artığı, senin gece gûndûz çalışma ile elde ettiğin bir arpa

16 ekmeği, ekşi ayran ve acı soğandan, çok daha kıymetlidir.

(Zino evi ve evinin eşyalarını göstererek) Sen şu evine bak, eşyalarına, ûstûmûz başımıza bak! Acaba hepsi satılsa, beyin kıravat dediği o fazladan boyunlarına bağladıktan bez parçasının fiatı eder mi? Hiç zannetmem.

BİRO - Doğru söylûyorsun Zino ama, sen de cimriliğinden giymiyorsun. Bilmez miyimki paran çoktur. Şeyhin başı için bugün elinde hiç olmazsa belki yirmi liran vardır. Giyin, sanki ben mi bırakmıyorum?

ZİNO - A... a, ne diyeyim. Ulan nasıl bu kadar param olsun? ûç tavuğun yumurtası ve ele bûktûğûm yûnle mi? Daha yeni Hacı Fermanlar, kilo başına bir lira vermeye başladılar. Bu sefer de bizim san tavuk yumurtadan kesildi. Demezler mi Allah fakire iki şey vermez, birini yerince diğerini alır.

BİRÖ - Nasıl olur kız. O tavuk bu zamanlar hiç yumurtadan ke-  
silmezdi?

ZİNO - Ben de öyle biliyorum. Herhalde o imamgilin folluğuna  
alıştı. Ama geçen gûn sordum, imamm anası yeminler etti.

BİRO - (Gûlerek ve Zino'ya takılarak) Hımm. Demek kilo başına  
bir lira yaptılar he? Eh doğrusu az para değildir ama biliyo-  
rum yine "param yok" diyeceksin.

ZİNO - Elbette diyeceğim, sanki eskisi gibi kuwetim mi kalmış.  
Geçen ay bûtûn çabalanma rağmen ancak beş kilo yûn bûke-  
bildim, onu da daha tamamen bûkemedim. Ev işi ve elin hiz-  
metçiliği de boynumdadır.

BİRO - İyi ya, peki beş kilo az mıdır? Yumurta parası da ayndır.

ZİNO - Yumurta! Yahu! Bak, geçen ay sana beş tane haşladım,  
tövbeler olsun ağzıma koymadım. Diğerlerini de Fato şehre  
görûrûrken ûç tanesi kınılmış, bu etti dokuz (Zino aynı za-  
manda parmakla da hesaplıyor), yok yok, sekiz etti. Zaten  
hepsi elli yumurta idi. Bilmiyorum, Fato tanesini yanm me-  
cidiyeye satmış; bana yirmibir mecrediye getirdi.

BİRO - Gördûn mû? Yûnûnki ile dokuz lira bir mecrediye etti,  
yetmez mi?

ZİNO - Evet Biro sözûndûr, az para değildir. Ama senin birşeyden  
haberinin yoktur. Şimdi herşey pahalıdır. Ev hali bu, tuz is-  
17

temez mi, gaz istemez mi? inanamazsın ne kadar kıtkanaat  
idare ediyorsam da yine ayda bir kilo gaz bile yetmiyor, bir  
iki çıra da komşulardan istiyorum. Geçen gûn eşeğini nalla-  
mak için yalvarma ile ancak kirvem Işo 10 mecediyeyi kabul  
etti.

Hele oğlum. Evet parasız yatılı okuyor ama, yine de para is-  
temez mi? İnanmıyorsan kahyaya sor, bu sene hiç yollamamışsam  
otuz-kırk lira oğluma yollamışım.

BİRO - Bak unuttum sormaya, sahi Bedo'nun mektubu içinde  
hayvan vergisi makbuzu gibi birşey vardı. Kahya onun ne ol-  
duğunu söylemedi mi?

ZİNO - O mu? Sana söylemedim. Mûdûr sana yollamıştı. Selâm  
söylüyordu.

BİRO - Mûdûr ne istiyordu. Peki onbaşı. Jandarma Dursun falan  
da birşey demiyorlar mıydı?

ZİNO - Ulan ne onbaşısı, ne jandarması. Bu isteyen mûdûr değil  
okul mûdûrûdûr.

(Bu esnada Zino, hamuru yoğurmuş, ûstûnû bir bezle örter, elini  
önündeki çanakta yıkar ve önlûğû ile kurular. Biro'nun karşısında  
yere oturarak, bu sefer başlar Biro'nun yırtık pırtık entarisini yama-  
maya.)

BİRO - Ne ne, mektebin de mûdûrû olur mu? Bizim nahiye mû-  
dûrû Turan Beyden sandım da sevinmiştim. Vay Zino vay, ço-  
cuk mektebinin mûdûrû he? Vay aklına.

ZİNO - Biro'ya bakın yahu, mektep mûdûrûnû beğenmiyor bile.  
Mektep mûdûrû, nahiye mûdûrûnden çok bûyûktûr Biro.  
Bûyûk hanım bir gûn dedi ki: "Mektepte okuyan çocuklar  
nahiye mûdûrû olurlar."

BİRO - Haydi canım sen de. O koca kan ne bilir? Sanki bir gûn  
köşkûnden çıkıp nahiyeye mi gitmiştir?

Vallahi diyorlar ki Turan Bey bir gûn dahi okula gitmemiştir.  
Kayseri Demokrat Parti'dendir. Bizim nahiyeye mûdûr tayin  
etmişler. Hem dûnyada nahiye mûdûrûnden bûyûk kimseler

olur mu? Cariye ve hizmetçisi var. Sûtû, peyniri, yağı, balı,  
18

tavuğu bedavadır. Atı da bedavadır, biliyorsun, o tarla meselesinden Hacıgil Turan beye verdiler.

Hemen geçen gûn Kerbetili köylûleri kavga ettiler. Rica minnet ettiler, hatır için Turan bey bin liraya onlan barıştırdı. Üstelik canlarının istediğini dövdûretilirler. Kimse Nahiye mûdûrûnû şikayet edemez. Etse bile tutmaz, kimse dinlemez.

ZİNO - O başka Biro. Hûkûmet bunları bilmez. Hatırlamıyor musun adı Atillâ mıydı neydi, bir Nahiye mûdûrûnû yine böyle şeylerden şikayet ettiler, hakimler onu hapsetti. Ama hiç mektep mûdûrleri hapse girer mi? Üstelik paşalar, valiler, hekimler "hocam" diye ellerini öpûyorlarmış.

BİRO - Akılsız Zino. Bûtûn bunlan ben biliyorum da hûkûmet bilemez öyle mi? Hem Turan bey bu işleri gizli yapmıyor ki? Onbaşı ve DP ocak başkanının gözû önünde bûtûn bunlar oluyor. Mûdûr fakir gidip Ankara'da da mı yağ-bal toplasın ki hûkûmet görsün?

İnanmazsın Zino, mûdûrûn bu kadar gelirinden vergi alacağına üstelik maaş da veriyor. Sen hâlâ mektep mûdûrû bûyûktûr de.

ZİNO - Bu işleri bilmem Biro. Ben beygilde çalışırken Kemal Paşa sağdı. Ne demokrat vardı ne ocak başkanı, ne rûşvet ve ne de hırsızlık. Ben bunlan ne gördüm ne duydum. Şimdi bunlar çıkmış, fakir hûkûmet ne yapsın. Ama hırsızlığın sonu yoktur.

BİRO - Ne diyorsun sen kız. Şimdi herşey bu ocak başkanlarının elindedir. Eskisi gibi hûkûmeti ne padişah ve ne de paşalar

yapıyor, bu ocak başkanları yapıyor. Onun için hükümet de onlardan çekiniyor.

(Bu sırada komşuların kızı Zero kapıda görünür, fakat Büro'yu görünce utanarak geri çekilir).

ZİNO - Gel kızım Zero gel, yabancı kimse yok, amcan Büro'dur.

ZERO - (Zincfya eğilerek ve sıkılarak) Hala, annem, "Bize bir kap un borç versin" dedi.

ZİNO - Yavrum Bedo'nun başı için yoktur. Yoksa ayıp değil mi?  
19

(Kız sûratle dışarı çıkar)

BİRO - Bu kimin kızı idi. Ne istiyordu?

ZİNO - Şey yahu, bir kap un veresiye istiyordu. Neyo'nun kızı idi.

BİRO - Peki niye vermedin?

ZİNO - Bizim un onlara olur mu Büro? Onlar buğday yerler.

BİRO - Kulak asma Zino. Yine bizim arpa, onların buğdayından iyidir. Bu kadar zamandır, arpa yeriz. Sen hiç bu "Kara Yara" denen kabus illeti duydun mu, gördün mü? Ne buğday ekmeği, ne bu Kara Yara. Geçen gün Halil'in evinin oradan geçtim, o sağ kalan kızları önüme çıktı, öküzlerim bile ondan ürktüler. Yüreğim sızladı, insan mıdır, hayvan mıdır, bilinmiyordu. Zavalılık.

Evet, bizim bir birçok çocuğumuz öldü. Çocuktur, elbette olacaktır, ama bu şekilde değil. Bu zavallıların diri diri etleri dökülüyor. Geçen gün Kelos'un oğlu Sekban ölmüştü. Hoca, kapının üstünde yıkıyordu, ben gördüm. Kimse görmesin o kuzu gibi olan Sekban, bir yığınak siyah kemik kalmıştı, tanıyamadım.

ZİNO - Gördün mû Biro, sen de "Çocuktur elbet ölecek" diyorsun. Ne mûnasebet, ben beş sene beygilde kaldım, görmedim ne onlann ne de başka beylerin çocuktan ölmedi. Bizimkiler hep açlıktan, soğuk ve bakımsızlıktan, bilgisizlikten ve fakirlikten ölüyorlar. Biliyorum, yalnız benim yedi çocuğum öldü, tek Bedom kaldı.

BİRO - Zino kız, bunlar Allanın işidir, onun emridir. Hem biliyorsun ki çocuklar, cennetin de gûlleridir. Gûlsûz cennet olur mu?

ZİNO - Evet, Allahın emridir. Fakat kurban olduğum Allahm emri yalnız biz fakirlere midir?

BİRO - Bak Zino artık kâfirlik ediyorsun ha! Evin yıkılmaya Allahm emrinden konuşuyorsun.

ZİNO - Yok yahu, ne dedik sanki. Allaha kurban olayım, o da adilâne hareket etmiyor.

BİRO - Yahu Zino acayıpsin sen. Kız bu kadar çocuk ölmezse, 20

nereye sığacaklar? Hemen biz, şu üç-dört komşuya hak, belki 30-40 çocuğumuz öldü. Cidden Zino eğer o çocuklar ölmeşeydi, şimdi etrafımız gençlerle bezenecekti değil mi?

ZİNO - Fakat bu "Kara Yara" buğday ekmeğinden değildir. Diyorlar ki, hûkûmetin köy sahibi bey ve ağalara verdiği tohumluk buğdaydır.

BİRO - Hayde canım sen de, tohumluk buğdaydan olur mu? O sene bir torba tohumluk buğdayımız arttı, değirmene götürdük. Hem Bedo da o vakit çocuktu, ekmeğini yedi, nede Kara Yara olmadı.

ZİNO - Biro, bu tohum bizim tohuma benzemiyor. Hûkûmet on-

lara verirken, eksinler diye ilaçlayarak veriyor. Fakat onlar ekmeden buğday pazannda ucuz ucuz satıyorlar. Esnaf da bu buğdayı arpa fiyatına fakir fukaraya satıyor. Ne olacak zaten hûkûmet bedava veriyor.

İşte Kara Yara'yı yapan o tuhumluk buğdaya sûrûlen ilaçtır. Zehirdir diyorlar.

BİRO - Yeter, seri de be! Hûkûmet deli midir ki bizi zehirlesin. Biz ölürsek, kim askere gidecek, kim vergi verecek, vallahi düşmanlar buraya kadar gelir, hepimizi soyar ve öldürür.

ZİNO - Haklısın Biro, hûkûmet bizi zehirlemez, fakat buğdayı alıp kazançtan için satanlar bizi zehirliyorlar.

BİRO - Bu da yalan. Gördün geçen sene baharda, Mayısın başında falan Diyarbakır'a gittim, arpalar başak vermişti. Bizim beyle buğday pazanna gittim. Senin dediğin o hûkûmet buğdayından yeni 100 ton almıştı, sattı.

ZİNO - Tabi ya. Sana söylemiyor muyum ki onlar satıyor. Tabii hûkûmet bilmiyor, ekiyorlar sanıyor.

BİRO - Allah Allah! Yahu Allah aşkına hûkûmet deli midir? Nasıl bilmez ki Mayıs ayında Diyarbakır'da buğday ekilmez. Herhalde buğdayın adı "tohumluk buğday"dır. Yoksa ekilsin diye verilmiyor.

Bir yandan da hûkûmet haklıdır da. Hoş beyler bizim gibi arpa ekmeği yiyecek değiller ya.

ZİNO - Kaç ton dedin, kaç ton?

BİRO - Yüz ton. Hakikaten Zino bu ton ne demektir? Sen böyle

21 şeyleri bilirsin. Hûkûmetin kilosu olmasın?

ZİNO - Yok canım kilo falan değil, ama ben de pek bilmem. Ben

beygilde iken, nugi, okka, tuht, kantar, kazan, kilo falan vardı, ama tonu görmedim. Arasıra bûyûk hanım "şu kadar ton" derdi.

(Tam bu sırada komşuları Misto amca içeri girer ve köy usulûnce Biro'yu selamlar. Biro ayağa kalkıp buyur eder, fakat hemen Misto yere çöker ve oturur).

MISTO - Biro daha yeni çiftten gelmişsin, neden bu kadar geç kaldın?

BİRO - Evet Misto amca geç kaldım, ne yapayım. İneklerim aç ve zayıftır, iş çıkaramıyorlar.

MISTO - Evet ilkbahar çifti zordur, fakat çok faydalıdır, değil mi Zino kızım?

ZİNO - Bilmiyorum ki amca, 30 senedir Biro hep böyle yorgun argındır, fakat ekmek ve yorgunluğu eledir. İşte bizi görûyorsunuz. Bahar çifti iyi olsa ne olacak, fena olsa ne olacak. Bize ne.

MISTO - Doğru söylûyorsun Zino yavrum, fakat ne yapacaksın, elimiz kolumuz bağlıdır. Ne yapabiliriz? idare kolay değildir ki?

ZİNO - Niye amca, bu devirde işini bilenler için idare çok rahattır. Geçen gûn Ahmo Bismil'deki DP kongresine gitmişti. Getirmediği şey kalmadı. Çaydanlığına kadar getirdi de şimdi her sabah çocuklarına çay yapıyor.

MISTO - Parti işi böyledir yavrum, fakat ben ve Biro yapamayız bu işleri. Lisan bilmeyiz.

Sahi ben çocuğunuzu sormaya gelmiştim, hayırlısı ne zaman geliyor?

ZİNO - Allah razı olsun, dört beş gûne kadar geliyor. Kim söyle-



di komşu?

MISTO - Kâhya söyledi.

ZİNO - Doğru. Mektubunu o bana okumuştı.

MISTO - Yahu Bedo çoktandır okuyor. Kaç sene oldu?

22

ZİNO - On bir sene oldu amcası. Ama artık Liseyi de bitiriyor.

MISTO - Biro şu Lise ne mektebidir?

BİRO - Baba, vallahi ben bilmem, Zino'ya sor.

ZİNO - Elbette bilirim. Lise, Diyarbakır'ın en bûyûk mektebidir.

Bey o kadar uğraştı. Ne Mete ne de Cengiz beyler liseyi bitiremediler.

BİRO - Zino'nun aklına bak Misto. Beyin çocukları liseyi bitirememişler

de Zino'nun oğlu bitirmişmiş. Eğer böyle ise de-

mek lise iyi birşey değildir. İyi birşey olsa beyler liseyi bize mi bırakalardı?

MISTO - Sahi Zino baco, Liseyi bitiren çocuklar ne olur?

ZİNO - Herşey olurlar. Fakat oğlum İstanbul'a gidip okumak istiyor.

BİRO - Aha! Şuna bakın. Herşey olurmuş. Peki Zino şimdi Bedo, jandarma onbaşı olabilir mi?

ZİNO - Yahu Biro deli misin? Onbaşı nedir? Bûyûk hanım diyor ki, Bedo askere giderse, subay olacak. Şimdiden bûtûn beygil oğluma Bedo bey diyorlar.

MISTO - Aman Zino, oğluna bey dedirtme. Bilmezsin, bu beylik fakirlerin başına neler getirdi.

ZİNO - Haklısın komşu. Yani dedim ki onlar söylüyor.

BİRO - Zino'yu bırakın yahu. Elin çocukları, evlendi, çoluk ço-

cuk sahibi oldu. Davar edindiler. Zino daha bûyûk hanımın peşinden gidiyor. (Biro gûlerek ve Mısto'ya göz ederek) Allah beni kahretsin, sanki Diyarbakır yaylasında kız kalmamıştı da gittim bûyûk hanımın Zino'sunu aldım.

ZİNO - (Gûlerek) Tabii Biro. Simde ne desen haklısın. Anlaşıyor ki o yalvarmalan, yakarmalan unutmuşsun. Ama ne yapalım, sen o çocuğa kurban olasın; yoksa bilirdim yapacağımı.

MİSTO -Yok Zino bacı, sen bunu, hileli söyledin. Bilirim Biro'yu seversin.

ZİNO - Ne yapayım kardeş. Alem gibi her gûn ev bark değişmem ya! Oğlumun babasıdır, otuz senedir artık Biro ile akra-  
ba olduk. Yoksa, sanki Biro'nun gözlerine mi aşığım.

23

(Zino bunları söylerken, Biro çocuklar gibi, mahcup mahcup önüne bakar).

MİSTO - Sana takılıyorum Zino bacı. Elbette böyledir. Ben Bedo'yu sormaya gelmiştim, geç oldu. Şimdilik Allaha ısmarladık.

(Misto ayağa kalkar, Biro yeni uyanır gibi olur, önünden kaldırdığı ekmek, soğan ve ayranı Mısto'ya göstererek)

BİRO - Aa, unuttum, Allah aşkına Misto, gel ekmek ye.

MİSTO - Yemin etme! Başın için, yedim, kalktım geldim.

BİRO - Bak Misto soğandır ha! Bilirim seversin.

MİSTO - Öyledir Biro. Cidden severim, fakat ben de soğan yedim. Ferso da soğanı sevdiğimi bildiği için ara sıra komşulardan ister, bana getirir. Bundan başka da sağ olasın, bu sene doya doya soğan yedik. Fazladan birkaç yûk samanım vardı,

her kazaya satmaya götûrdûkçe, iki ûç kilo soğan alırdım.

BİRO - Afiyet olsun Misto. Bilirsin ben bir yere gitmem. Böyle şeyleri Zino bacın dûşûnûr. Daha yazdan saklamıştı, fakat yazık artık yeşermeye başladılar.

ZİNO - Nerde, yok valla, benim de kalmadı. Birkaç baş kalmış, sakladım ki oğlan gelirse, ona yumurta ile içli köfte yapacağım.

MİSTO - Ha haaa! Demek Zino bacı bulgurun da kalmış?

ZİNO - Nerde kardeş, bir kap kadar bulgur ufağım vardır, onu da Biro'dan sakladım, yoksa şimdiye kadar Biro, onu da bana yaptırmıştı.

MİSTO - Ee, hayden çocuklar yine Allaha ısmarladık.

(Zino ile Biro kapıya kadar misafirlerini yolcu ettikten sonra yerlerine dönerler, Zino yûn bûymeye başlar, Biro da eşeğinin palasım önüne getirerek, yırtık pırtıklarını dikmeye, tutturmaya uğraşır.)

ZİNO - Sahi Biro oğlan gelirse, ekmeği ne yapacağız?

BİRO - Neden? O çuvaldaki un değil midir?

24

ZİNO - Evet vardır ama, arpadır, çocuk yemez ki!

BİRO - Yeter artık be, bana iş çıkarma, arpa marpa, babasının ekmeğidir, yiyecek. Şimdi size nereden buğday bulayım?

ZİNO - Olmaz ki Biro. Bu kadar zamandır, oğlan buğday ekmeğine alıştı, şimdi nasıl birden bire arpa ekmeğini yesin? Mutlaka hastalanır. Hatırlamıyor musun, ilk evlendiğimiz zaman, ben de beygilde buğday ekmeğine alışmıştım. Sende birden bire arpa yiyince az daha ölüyordum.

BİRO - Ne yapayım. Elimde ne var ki? Senin paran var. Kâhya da beyin buğdayım satıyor. Git oğluna al, bırakmadık mı yani?

(Zino yanını Biro'ya çevirerek kuşağının altından bir çıkın çıkarır. Dişleriyle açar. içinden 15 lirayı alarak Biro'ya verir.)

ZİNO - Al sana 15 lira. Bize bir ölçek al, ona yeter. Benle sen yine gizliden arpa yeriz. Ama Biro, Bedo'nun başı için oğlan bilmesin. Biliyorsun oğlum çok içlidir. Bilse ki biz arpa, o buğday yiyor, bu sefer ûzûntûden hastalanacaktır.

Birinci perdenin sonu

25

## İKİNCİ PERDE

Sahne: Yine fakir Biro'nun evidir.

Bedo okuldan gelmiştir, mektep elbisesiyle annesinin yanında bir kepek yastığın üstünde oturmuştur.

Zino, topraktan duvarın önünde yûn bûkûyor. Biro da duvar dibinde çulun üstünde uzanmış bir yastığa dirseğini koymuş vaziyette, keyifli keyifli, çoluk çocuğunu seyrediyor. Kıyafetleri eskisi gibidir.

Ailece sohbet ederler.

BİRO - Ee Zino. Bakıyorum, çok neşelisin.

ZİNO - Niye neşeli olmayayım Biro, çok şûkûr aslanlar gibi oğlum yanımda, sanki bûtûn çevremizde oğlum gibi bilgili kimse var mı zannediyorsun?

BİRO - Aha. Zino'nun oğlu bilgiliymiş. (gûlerek) işte yûzû geçen sene bir gûn beraber çifte götûrdûm, boyunduruğu ineklerin boynuna ters koydu.

BEDO - Ne yapayım baba, o zaman daha görmemiştim. İstersen şimdi götûr, bak nasıl biliyorum.

ZİNO - Yok yok oğlum, hemen hiç de çift öğrenme. Baban 40 se-

26

nedir o sapanın arkasındadır, ne elde etti sanki?

Hem deniyor ki; artık beygil çift makinasını getirip, çiftçileri köyden çıkaracaklarmış.

BİRO - Nasıl olur Zino? Makina gelirse bu kadar köylû nereye gidecek?

ZİNO - Nereye giderlerse gitsinler, bey onlan mı dûşûnecek? Yine bizim bey iyi. Elinki dört beş senedir köye makina getirip, bûtûn köyû yalnız kendi hesaplarına ekip biçiyorlar ve köylûleri de kovdular. Hepsi şehir mehirlere dökûldûler, kimi öldû, kimi de dilenci oldu. Diyarbakır o senelere dönmûş, dilenciden geçilmiyor. İnsan hem onlardan hem kendinden ar ediyor. Ama ne yapsın fakirler, şehirde dilenmeden gayri iş yok ki.

BİRO - Ben inanmıyorum ki hûkûmet, beylerin köyleri yıkmasına mûsaade etsin.

ZİNO - Oğlum Bedo, babanın aklına bak. Yani Biro, hûkûmet beye mani olabilir mi? Tapu beyin, istediğini yapar, kimse de kaşamaz. Üstelik o çift makinelerini de hûkûmet beylere veriyor. Tahum da veriyor ama, onlar ekmiyor, satıyor o başka.

BİRO - Ne yapayım? Başlarını yesinler. Sen ne korkuyorsun? Biz nereye gitsek, şimdiki durumumuzdan daha fenası yoktur.

ZİNO - Nasıl yoktur Biro? Nasıl olsa, köyde kendi damımızdayız, kimse içimizi bilmez. Ama yann şehirlere, ayak altına dûşersek, nasıl daha fena değildir.

En zor şey, insanın kendisini dilenci durumuna dûşûrenden, dilenmektir.

Evet köy bizim değil, ev bizim değil ama benim de mezarlık-

ta yedi tane evim var. Onlan bırakıp nereye gidebilirim?

BİRO - Yeter be! Yine ölûlerden konuştuğun. Zaten sen hiç gûzel konuşmazsın. Sözüñ ya ölûlerden veya beylerdendir.

Haydi söyle bakalım, şimdi oğlun ne olacak?

BEDO - Baba sen ne olmamı istersin?

BİRO -Jandarma onbaşı.

BEDO - Nasıl onbaşı baba. Onbaşı olur mu?

BİRO - Ne? Daha mı bûyûk olacaksın?

27

ZİNO - Elbette Biro. Bilmiyor musun ki oğlum daha da bûyûk olacak?

BİRO - Ha hay! Zino'ya kalsa "Oğlum nahiye mûdûrû dahi olur" diyecek.

BEDO - Tabii baba, elbette nahiye mûdûrû olabilirim. Ama daha mûhim işler vardır. Doktor, mûhendis, hakim, avukat gibi.

BİRO - Ulan oğlum sen de annen gibisin. Senin o dediklerini yaparlar mı hiç? Bu kadar bey ve ağa çocuğu varken, seni mi mûdûr ve doktor yapacaklar?

BEDO - Yok baba yok öyle değildir. Şimdi kim okursa, herşey olabiliyor.

BİRO - Olur mu oğlum. Böyle olsaydı, fakir fukara çocuklarını şuna buna çoban yapacaklarına okula verip, mûdûr ve hakim yaparlardı.

Sahi Bedo, o savcı dediklerinin okulu nerededir? onlar bûs-bûtûn ateş gibidir.

O sene bizi savcıya götürdüler. Savcı döğûn dedi. Bizi dövûdüler, tevkif edin dedi, ettiler. O savcılar görûlmemiş şeylerdir.

Sen birine, şuna bir tokat vur desen seni bir sene hapsediyor-

lar. Ama savcı her gûn hakimlere şunu hapsedin, hatta bazen asın dediği halde, kimse kendisine ceza veremiyor.

O çok iyidir oğlum ama, ne vakit seni onun gibi yaparlar.

BEDO - Yaparlar baba yaparlar. Okuyan her çocuk, istediği şeyi olur. Niye bırakmasınlar ancak bilgisiz ve fakir babalann çocukları çoban, sığirtmaç oluyorlar.

ZİNO - Peki Biro, ben olmasaydım, sen bu çocuğu okutur muydun?

BİRO - Doğrusu hayır.

ZİNO - İşte diğerleri de senin gibidirler. Bilmiyorsunuz ki, her şey okulla olur.

Bir gûn bûyûk hanım demişti ki, beyin dedesi de bilmem Lice'nin hangi köyünden Diyarbakır'a gelmiş, okula gitmiş, okumuş ve böylece bey olmuş.

BİRO - Haydi canım sen de, yine bûyûk hanım. Biliyorsun bey çok akıllıdır. Oğlum Bedo, hani hatırlarsın ya geçen sene buraya gelmişti; sana demedi mi "Ulan okuyup da ne olacaksın, 28

baban gibi işine baksaydım daha iyi değil miydi sanki."

BEDO - Elbet bey böyle diyecek baba. 40 senedir sen, ona çalışıyorsun. İster ki ben de 40 sene oğluna çalışayım. Yoksa bey bilmez mi ki okul ve okuma çobanlığından, ortaklığından daha iyidir.

(Bu sırada Sado amca, Kelo ve Serohan çocuklarının gelişi için "gözûnûz aydin"a gelirler. Ev halkı ayağa kalkarlar. Gelen misafirlerin kıyafetleri de Biro'ninkinin benzeridir. Onlar da Biro'nun yanında çula oturup sohbe başlarlar.)

ZİNO - Biro misafir geldi, kalk.

SADO AMCA - Kızım gözûn aydın, maşallah delikanlı olmuş oğ-  
lun. Hoşgeldin aziz genç. Allah seni adın gibi şen etsin.

BEDO - Ellerinizden öperim dede.

ZİNO - Allah sizden razı olsun komşu.

SADO - Bakm çocuklar, kim ne derse desin, ben daima okuldan yanayım. Seferberlikte Mam Hıdır adında Sûleymaniyeli bir subayımız vardı. Nur içinde yatsın, hep derdi ki: "Eğer çocuklannızı okutmazsanız bu halden kurtulamazsınız."

ZÎNO - Mekanı cennet olsun inşaallah, sözûdûr.

SADO - Ee. Sevgili genç söyle bakalım siz okulda neler öğreni-  
yorsunuz. Kahya mektubunu okumuş, köyûn içini doldurdu.  
"Biro'nun oğlu Diyarbakır okulunun en çalışkan talebesidir"  
diye. (Sado amca gûlerek) Bugûn seninle imtihan olacağım.

SEROHAN - Zino bacı Kahyanın gözû iyi değil, oğluna nazar  
değmesin. Beni dinlersen, oğluna bir muska yazdır, okut.

KELOS - Serohan'ın dediği doğrudur. O sene ineğimiz yeni do-  
ğurmuştu, köy meydanından geçti. Kahya gördû ve "Yahu bu  
inek kimindir? Memeleri ne kadar da bûyûktûr" dedi. Dört  
gûn geçmedi inek, "kara meme" hastalığına tutuldu, kurudu  
ve buzağısı da öldû.

BİRO - Doğru. Kahya hiçbir zaman maşallah demez.

ZİNO - Bak hele, gözûm çıksın nereden bileyim ben fukara. Öy-  
le ise bu akşam evde çöre otunu yakayım, oğlumu tûtsûleyeyim,  
nazar fenadır.

29

SADO - Birşey olmaz, bu akılsızlıktan vazgeçin yahu. Diyorlar ki  
bazı yerlerde inekler 20-25 kilo sût veriyor. Peki neden göze  
gelmiyorlar?



Haydi oğlum Bedo, demedik mi birbirimizi sınavacağız, soru soracağız diye.

BEDO - Peki dede hay hay sor.

SADO - Yok yok oğlum istersen sen sor.

BEDO - Peki amca sen bilirsin, sor.

SADO - Oğlum Bedo, bu kaplumbağa neden kaplumbağa olmuştur?

BEDO - Amca nereden bileyim ben?

SADO - Ya demek bilmiyorsun, dur öyle ise ben sana anlatayım:

Derler ki bizim köy gibi bir köyün de zengin bir beyi varmış.

Bu bey, halkın sıkışık zamanlarında ellerindeki ekinlerini

kendi büyük ölçeğiyle ucuza alır ve yine kıtlık zamanında bu

sefer kendi küçük ölçeği ile fakat pahalıca yine fakir halka satarmış.

İşte beyin halka karşı olan ihtikandan dolayı Allah

onu iki ölçeğin arasına sıkıştırarak kaplumbağa yapmış.

BEDO - Cidden dede, bu güzel bir masaldır.

SADO - Ne masalı yavrum, bunlar doğrudur. Eğer peygamber

efendimizin hatm için olmasa idi, bugün bu pahalılığı yapan

ve dalavereler çevirenlerin hepsi hayvan olmayacak mıydı?

Başın için o vakit Türkiye'de çok az insan kalacaktı.

ZİNO - Oğlum Sado Amca çok gezmiş, bilgindir.

SADO - Yok canım ne biliyorum ki, bak Bedo oğlum, sıkılıyorsan sormayayım.

BEDO - Yok dede, cidden çok güzel konuşuyorsun. Zaten bu sorduklann

da kitaplarımızda yoktur.

SADO - Bunlar kitaplarınızda yoktur ya. Tabii olmaz. Çünkü siz

ters yüz okuyorsunuz oğlum. Gûya insanlar ilkin kertenkele

imiş, sonra maymun olmuş ve daha sonra da insan olmuş. Seferberlikte bir Alman subayı bize böyle ders veriyordu. Halbuki doğrusu ilk yaratık insandır ve Adem peygamberdir.

BEDO - Ama dede...

SADO - Dede ne? Yoksa sen de yok mu diyeceksin?

Dur şimdi senden başka bir sorayım. Peki oğlum, ya bu 30

leylek, nasıl leylek olmuş?

BEDO - Dede nereden bileceğim, biz böyle şeyleri okumadık.

SADO - Okumazsınız ya. Öyle ise ben sana anlatayım.

Diyorlar ki: Çok zengin bir köy sahibi varmış. Yine geçen sene bir kıtlık olmuş. Aynı köyde dul, güzel, namuslu ve üç çocuk annesi bir kadın da varmış. Çocukları aç kalıyor. Açlıktan ağlıyorlarmış. Kadın ne yapacağını şaşırıyor. Başında akıl kalmıyor fukaranın. Komşulardan elinde verecek şeyleri yok. Ancak kadına diyorlar ki: "Beyin evinde ekin var, satıyor, git söyle eğer sana borç verirse yazın harman zamanı biz kendisine öderiz."

Öksüzlerin annesi beye gidiyor, anlatıyor, yalvanyor, fakat para etmiyor. Zino da kızım gibidir, çapkın bey kadına diyor ki: "Hayır ben ekini borç vermem, fakat eğer kilodunu çıkarıp şu merdivenden kilotsuz inip çıkarsan ben sana gerekli zahireyi vereceğim."

Fukara ne kadar yalvanyorsa da bey karandan caymıyor. Çocukları da evde açlıktan ağlıyorlar. Kadın tevekkülle der ki: "Ey Allahım sen görüyorsun ben ne yapabilirim, herhalde bu işler emrindir" ve beyin dediğini yapar.

Kadın inip çocuklarına yiyeceği götürdükten sonra beyin bu

ahlaksız hareketine karşı Allah derhal onu bir leylek yapıyor ve işte o günden bu güne kadar leyleğin böyle boynunu oynatarak lak lak etmesi ondandır.

BEDO - Aman dede ne gûzel hikâyeler.

SADO - Bak yine hikaye diyor. Oğlum bunlar hikaye değil, hep olmuş şeylerdir. Bu gördüğün bûtûn hayvanlar eskiden birer insandı, fakat kötülükleri yüzünden hayvan olmuşlardır.

Eşek, öküz, tilki, köpek, keklik, gûvercin ne bileyim ben hemen bûtûn hayvanlar böyledir.

Bir daha sorayım mı?

BEDO - Hay hay dede, tabii.

BİRO - Oğlum Sado Amca çok bilgilidir, kim onunla başa çıkabilir?

ZİNO - Aman Biro, sen de...

SADO - Fakat siz şimdiki okullular kendi etrafınızdaki hayvan-  
3i

lara bakmıyorsunuz da gidip denizlerin derinlerindeki solucanları inceliyorsunuz, dağ başlarındaki kayalarla balık kemiklerini araştırıyorsunuz. Serefberlikte Çanakkale'de asker-  
ken subayımız ordaki bir kayanın deniz hayvanlarının kemiklerinden olduğunu söylüyordu.

KELOS - Aha! Bunlar nereden bunları bilecekler amca, şimdi herşeyi ters okuyorlar.

SADO - Yok ulan! Ben Bedo'ya takılıyorum, yoksa onlann bildiklerini biz nereden bilelim. Dediği gibi bizim bûtûn bilgimiz hikaye ve masallardan ibarettir.

SEROHAN - Yok valla amca, şaka yapıyorsun. Yani bilmez miyiz ki sen bir hoca kadar bilgilisin.

BEDO - Dede sizin bu kadar bilgili olduğunuzu bilmezdim.

SADO - Ne bilgisi oğlum, boşunadır. Yazık ki okumadık, bûtûn hayatımız bu pislik ve fukaralık içinde geçti. Bey ve ağaların zulmû de cabası.

Bakın hemen benim başımdan geçenlerin bir kısmını anlata-  
yım: Sultan Hamit ve Reşat devrinde beni yakalayıp bizim be-  
yin kardeşinin oğlu yerine askere gönderdiler. Nereleri gez-  
medim ki: Selanik, Yemen, Şam, Bağdat, Halep, Kars, bir yer  
bırakmadım, dört kere yaralandım.

Kıtlıklarda kavruıldum. Ölenlerimize şehit, yaralı ve sakat  
olanlanmıza

da, dilendik ama defterlerinize gazi yazdılar. Sağ kalanlanmız  
da işte böyle köy sahiplerinin kölesi olduk. 75 se-  
nedir bu köydeyim, geçen gûn kahya bana kızdı, olmadık  
şeyleri başıma getirdi. Annesi olmasaydı beni köyden kovu-  
yordu.

BİRO - Cidden kahya, istediğini köyden sûrebilir. Kahya köylû-  
ye sert olduğu için bey onun sözûnû kırmıyor. Geçenlerde  
bey buraya gelmişti hepimizin yanında: "Bakın köylûler, kah-  
yanın canı ne isterse yapar" dedi.

ZİNO - Allah yanına komasın.

SADO - Dur Biro yahu, Bedo bize konuşsun. Bilmezsiniz ki bey  
böyle diyecek. Görûlmûş mûdûr ki avcı, tazısına tavşanı ya-  
kalarken incitmemesini öğretsin? Hayır ancak yememesini  
belletir.

32

BEDO - Dede ne dememi istiyorsunuz?

SADO - Oğlum Bedo, bu yeni icatlardan ûç şeye aklım ermiyor.

Ewela diyorlar ki insanlar aya gitmiş. İkincisi yine diyorlar ki mesela buradan Çini Maçini bombardıman edebilirler. Diğer de diyorlar ki bir bomba yapmışlar adı Atom'dur nedir, işte ondan bir bomba ile uzak olsa dahi bir şehri bir anda yakmak mûmkûnmûş. İşte bunlan anlamak istiyorum.

BEDO - Dede gazetelerimizin yazdığına göre İngiliz ve Amerikalılar, Ruslann aya bir makine çarptıklarını görmüşler. Ayrıca Ruslar ve Amerikalılar, aya ve diğer yıldızlara gitmek için hazırlanıyorlar.

BİRO - Ulan sus oğlum. Şeyhin başı için köyde bu laflann duyulursa, sana ya deli ya kafir derler. Kahya da bizi köyden kovabilir. Töbe töbe yarabbi, nasıl aya gidecekler?

SADO - Allahını seversen Biro sen sus. Üstelik kahya ve köylû, Bedo'yu beğenmeyecekler ha? Sen söyle oğlum söyle. Bu fakaralar ne okumuşlar ne de gezip görmüşler, ne bilirler?

Sahi Biro, sen askerlik yaptın mı?

BİRO - Evet, on sekiz ay.

SADO - (Alayla) Aman cidden kendini öldürmüştün. Peki nerede yaptın?

BİRO -Siirt'te.

SADO - Ne idin?

BİRO - Seyis idim.

SADO - Gördün mü oğlum Bedo, Biro'nun askerliğini. Hem Siirt'te ve hem de seyis yani köyün çobanlığından, at çobanlığına. Peki Tûrkçeyi nasıl öğrendin?

BİRO - Yahu ne bilme ne hal. Bu bildiğim birkaç Tûrkçe sözün bir kısmını subayımdan, bir kaçını da nişanlı iken beygile gıderdim, oradan belledim.

Sahi unuttum, bir sene kadar nahiyede bekçilik ettim, biraz da jandarmalardan.

SADO - Peki peki Biro, sus artık senin bilgin...

Peki yavrum, o uzağa giden mermiler nasıl gider?

BEDO - Dede onlar da aya gidenler gibidir. Ancak biri dik gider, diğeri dûz.

31

SADO - Gördûnûz mû delikanlı ne gûzel belletiyor?

SAROHAN - (Esneyerek) Ne yazık ki namaz zamanı geldi.

SADO - İnanın seferberlikte, Diyarbakırlı bir subayımız vardı.

Hep derdi ki: "Yeni şeyleri öğrenmek de namaz kadar sevaptır."

KELOS - Yok amca. Yahu namaz vakti daha uzaktır.

SADO - Ciddi mi? Peki öyle ise. Haydi dedenin babası Bedo, şu atom bombasını da bize anlat. Birinci Cihan Harbinde en kuwetli bombalar, "Alman bombası" dedikleri idi. Yine de ancak dûştûğû yerden, iki buçuk ev kadar tahrip ederdi.

BEDO - Evet dede. O bombalar doğrudur. Ancak nasıl yapıldığını bilmeyiz. Şimdilik dûnyada ancak Ruslar, Amerikalılar ve İngilizler biliyorlar ve kimseye de nasıl yaptıklarını söylemiyorlar.

SADO - Vay! Yine mi İngilizlerin parmağı vardır? Öyle ise bu işte hayır yoktur. Çûnkû onlar daima egoisttirler. Zaten Birinci Cihan Harbinde bizi mahveden onlar değil midir? Peki oğlum, şimdiye kadar bu bombayı birbirine karşı kullanan olmuş mudur?

BEDO - Tabii dede. İkinci Cihan Harbinde Amerikalılar, Japonlann iki şehrine attı. Birinin adı Hiroşima idi. Bizim Diyarba-

kır'dan bûyûktû. Bir atom bombası ile derhal 120 bin insan öldû ve şehir de tamamen yandı.

ZİNO - Vay Allahtan kokmazlar vay. Demek hakikaten bunlar gavurdur.

SADO - Hakikaten böyledir. Geçen gûn Diyarbakır'da birkaç kişi de böyle konuşuyordu, ama kimse kulak asmıyordu, zan nediyorduk ki yine ağzımızdan laf almak isteyen polis ve muhbirlerdir.

Peki oğlum Bedo, o uzağa giden gûlleler nasıl giderler? Acaba uçaklar gibi benzinle mi, yoksa top gûllesi gibi barut ve kapsûlle mi?

BEDO - Dede biz bunlan okulda okumadık. Ancak, geçen gûn bir mecmuada deniyordu ki: Bu fûze dedikleri mermiler birbirine eklenmiş birkaç fişek gibidir. Önce biri patlayıp fûzeyi ilerletiyor, tam onun hızı bitince diğeri patlıyor ve böylece

34

tespit edilen hedefine vanyor.

SADO - Sağ olasm oğlum, inanın ki böyle olacak.

KELOS - Vallaha ben askerde böyle şey duymadım.

SADO - Nereden duyacaksın bunlan yavrum. Biz bûtûn aklımızı zı fesatlığa, particiliğe vermişiz. Bu halktır, bu demokrattır; bilmem bize ne olmuş.

Hemen 30 senedir halktı, biz buyduk, beyler buydu. Ve şimdi de 9-10 senedir, yine buyuz ve yine beyler bu sefer demokrat olmuşlar. Biz fakirler için hepsi birdir. Partiler beylerin partileridir.

BİRO - Nerede hepsi bir, ben Halk Partisi'ni tutarım.

SEROHAN - Yok vallaha Biro. Demokratlar halktan iyidir.

SADO - Kûller başınıza. Şimdi de ne konuştuğunuzu biliyor musunuz ahmaklar. Allah rahmet eylesin babamın bir hikayesi vardı, hiç unutmuyorum. Derdi ki: "Kıtlık bir senede, bir kervan ailelerine zahire almak için yola çıkarlar, önlerine eşkıyalar çıkar, soyar ellerini kollannı bağladıktan sonra da biraz ötede soygunlannı paylaşırken, aralarında kavga çıkar ve başlarlar birbirlerini vurmaya. Bu sefer de soyulmuş, elleri kollan bağlı olan fukaralar o halleri ile hem eşkıyalara acımışlar, hem de birbirlerine vurmamalan için yalvarmaya başlamışlar."

Başınız için, bu partiler hususunda biz köylûler de, tıpkı eşkıyalar tarafından soyulan kervan ehline dönmûşûz.

KELOS - Çocuklar, acaba gavurlar arasında da partiler yok mudur?

BEDO - Olmaz olur mu, değil mi dede?

SADO - Var oğlum, var ama bizimkiler gibi değil.

BEDO - Nasıl bizimkiler gibi olsun, onlarda ne ağa, ne şeyh ne de bey vardır. Buralarda ise parti bunlanndır. Ve biz de onların korkusundan istediklerine reyi veriyoruz. E, elbette mebuslar da, partilerin başındakiler de onlara çalışacaklardır.

SADO - Kalkın yahu akşam oldu, hayvanlanmız gelecek. Efendiden aynlamıyorum ama geç oldu.

BEDO - Teşekkûr ederim dede. Anne bu akşam dede bizde yemek yese?

35

ZİNO - Cidden dede, bu gece Bedo'nun yanında kalaydın.

SADO - Oğlum sağ olsun Zino. Adetim değildir, fakat imkan buldukça size bir başvururum.



(Misafirler kalkar, ev sahipleri onları selametler.)

ZİNO - Baş-göz ûstûne geldiniz komşular, evinizdir, ne zaman gelmek isterseniz buyurunuz.

BEDO - Dede, sabahleyin yine geliniz, bu sefer ben sizden soracağım.

SADO - Sana takılıyorum oğlum, ben neyim ki senle iddiaya gireyim. Bizim tûm bilgimiz birkaç masal ve atasözûnden ibarettir.

BEDO - Hayır dede ciddi gûzel konuşuyorsunuz.

SADO - Tevazu gösteriyorsun oğlum, zaten okuyan bir kimse bûyûk ile alay etmez. Onun için 40 senedir dilimde tûy bitti, hep bizim köylûlere söylerim: Yemeyin, içmeyin, hatta gidin bir şehrin kenannda oturun, amelelik yapın ama yine de çocuklannızı okutun diye.

Mesela; biliyorsun oğlum Simko senin yaşındadır. On sene babasıyla uğraştım, bir tûrlû okutmadı. Hûrmûz de beni dinlemedi, geçen sene beylerin Dicle kenanndaki köyûnde biri vuruldu, Simko'nun boynuna attılar; Allah razı olsun hakimden, yaşı kûçûktûr diye cezasını 10 seneye indirdi, şimdi Diyarbakır hapishanesinde sûrûnûyormuş. Bitler gözûnû yiyormuş. Zavalılık, beyin yûzûnden hapse girdiği halde dendiğine göre bir gûn bile bey yanma uğramıyormuş. Babası da fakirdir. Elin uşağıdır, evladım, çocuk hapishanede ölecek.

Eğer o da senin gibi okusaydı böyle olur muydu? Şimdi oda bir ışık gibi aramızda ışıldardı ve bize doğru bir yol gösterirdi.

Görûyorsun evladım, biz hepimiz buralarda bilgisizlikten kör

ve şaşkın kalmışız, her gelen bize bir tekme vuruyor.  
Evladım ancak sizin gibiler bizi kurtarır, eğer sen Zino'nun oğlu olmaz da beyin oğlu olsaydın, biz böyle senin etrafında oturur da güzel güzel konuşabilir miydik? Herşeyin önce cinsine,

sınıfına faydası dokunur. Demezler mi her kuş kendi sûrûsûyle olur.

KELOS - Nasıl Sado Amca?

SADO - Öyledir oğlum, hayvanlarda böyle değil midir? Şimdi bizim köye yabancı bir atla bir keçi gelse ve bunları köyün içine salsak, keçi keçilerin yanına, at da atların yanına gitmez mi? İnsanlar da böyledir. Okuyan köylü çocuğu olmazsa, şehirli çocuğu bey çocuğu aramıza gelir mi hiç? Onlar ancak dört senede ancak seçim zamanı tiksinererek buralardan geçerler.

Yeter oğlum. Derdimiz çoktur. Üstelik dertlerimizi söylemeye bile korkuyoruz. Çok defa bu yüzden başımıza iş gelmiştir. Allah zalimlerin yanına komasın.

(Ev sahipleri misafirlerin arkasından şöyle seslenirler.)

ZİNO - Başımızın üstüne geldiniz komşular.

BİRO - Hoş geldiniz sefa geldiniz.

BEDO - Dede, tekrar gelin.

ikinci perdenin sonu

37

ÛÇÛNCÛ PERDE

Yer: Yine Biro'nun evidir. O gün Biro çifte gitmemiş evde kalmıştır Zino saçta ekmek yapıyor.

Biro ve Bedo da ağaç bakraçtan çukur tahta kaşıklarla ayran ve

yufka sac ekmeđi yerler.

ZİNO - Ođlum bu gece damda rahat uyudun mu?

BEDO - Tabii anne. Ben damda yatmayı çok severim.

BİRO - Kız bilmez misin ki bizim damlann temiz havası, şehirlerin o pis ve havasız odalanndan çok daha iyidir.

ZİNO - Biro sus. Yahu ne bilirsin sen. Sana kalsa, herşeyin içinde...

BEDO - Anne kurban olayım babamı ûzme.

ZİNO - Ođlum bak, bugûn çiftte de gitmedi.

BİRO - Zino, şeyhin başı için bugûn hem yorgunum ve hem de Bedo'dan aynlamadım. Evin yıkılmasın, beş altı aydır bir gûn evde kaldım mı?

Ođlum Bedo, annen de beylerden yemiş, içmiş, hiç insafı kalmamıştır.

ZİNO - De ođlum babana bak! Otuz senedir yanındayım, ne zaman söz açılrsa, beni de onlarla kanştınr. Babanın vicdanı budur işte, yoksa ben fakiri nerde...

(Biro ayrandan bıyıklarını siler ve Bedo'yu öper)

BİRO - Ođlum artık annen hiç şakaya gelmiyor. Hele sen geldikten sonra, bûsbûtûn kudurdu. Kız senden ve bu çocuktan başka kimim neyim vardır, deli.

BEDO - Anne, ben babamı çok özlemiştim. Bir gûn şehirde birini gördüm, babam sandım, Mardin Kapı'ya kadar kovaladım, o olmayınca çok ûzûlmûştüm.

ZİNO - Ya beni özlememiş miydin?

BEDO - Nasıl anneciğim, seni daha fazla özlemiştim.

BİRO - Ya! Demek daha fazla Bedo ha. Şaka söylüyorum. Cidden,

anneninin bizde hakkı çoktur. Bize çok emek verdi Fukara.

(Bedo, elindeki kaşığı ve ekmeği bırakır, ağzını mendille siler)

BEDO - Anne vallahi doydum.

ZİNO - Ayy! Yumurta vermeyi unuttum. Haydi getireyim yiyin, he oğlum?

BEDO - Yok anneciğim, çok yedim.

BİRO - O hooo... bugûn Zino çok bonkör olmuş.

ZİNO - Bak hele, ne zaman seni aç bıraktım Biro?

BİRO - Şaka yapıyorum be. Aferin bak işte ben de doydum.

(Biro, önündeki ayran ve ekmeği bir kenara iter.)

BEDO - Afiyet olsun baba.

BİRO - Sağol oğlum.

ZİNO - Baban böyledir ama, yemesi yoktur fukaranın, az yer.

BİRO - Herhalde bağırsaklarım kûçûlmûştûr.

ZİNO - Elbet Biro, sanki sen bir gûne bir gûn el gibi gûzel bir ekme mi yedin? O sene şehre gidince, şehirlilerin şişmanlığına şaşmıştım. İşkembeleri ambar gibi olmuştu. Kadın, erkek, bu kapıdan giremezlerdi.

39

BEDO - Ama anne o şişmanlık iyi değildir. O gördûğûn şişkoların hiç biri, babamla bir adım atamazlar.

ZİNO - Nerde oğlum, babanda da iş kalmamış.

BİRO - (Gûlerek ve gururla) Ben Zino! Evin yıkılmasın ben daha ayaktayım he! O şehirli mehirliler nedirler ki? Evet göbeleri bûyûktûr ama, kofturlar. Yalnız göbekte olmuyor ki!

(Gûn epey yûkselmiştir. Sado Amca ve komşuları, oğullarının gelişi ve okulu bitimiş olması şerefine yine Biro'nun evine gelirler.)

BEDO - Anne bak kimler geldi.

BİRO - Zino çulu ser, buralara bir sûpûrge vuraydın.

ZİNO - Biraz ewel sûpûrdûm Biro. Temizdir.

SADO - Selamûnaleykûm.

BİRO - Aleykûmselam, buyurun çula, oturun komşular.

ZİNO - Baş-göz ûstûne geldiniz komşular. İçerde duman yoksa?

Bu yufkacık kaldı bende sacın önûnden kalkacağım.

SADO - İşine bak kızım, ama ne diye ekmeğini tandıra  
götûrmûyorsun

da, saca bırakıyorsun?

ZİNO - Ama çocuk sac ekmeğini özlemiş hem de ne bileyim,  
buğdaydı utandım tandırlara götürüreyim. Korktum ki çocuk-  
lar görûrler, nefistir çeker gûnah diye.

(Zino, birkaç ekmeği üst üste koyarak misafirlere ikram eder.)

Kurban olayım sıcak yemek yiyin.

SADO - Daim olsun kızım. Bedo'nun başı için yedim de geldim.

KELOS - Allanın adına şeker olsa yiyemem.

SEROHAN - Yiyebilseydim utanacak mıydım sanki?

(Zino ekmeğini leğenine koyar, sacı ateşten kaldırır, ateşi söndû-  
rûr, Bedo çok neşelidir)

BEDO - İyi ki geldiniz dede.

SADO - Tabii geliriz oğlum, sana gelmesek kime gideriz. Daha  
fakir köylûler kıymetini bilmiyorlar. Seni anlasalardı, bugûn  
40

davul zurna ile dûğûn yaparlardı. Ama zavallılarda akıl şuur  
mu kalmış, felaketler önûnde rûzgann önûnde sûrûklenen  
birer kuru yaprak gibi olmuşlar.

REŞO - Ne yapalım Sado Amca, fukaralığın evi yıkılsın. Sen her  
zaman demiyor muydun ki: "Fakirlik erkekliğin pasıdır" di-

ye.

SADO - Öyledir. Bedo oğlum, senin neşenden işimizden soğuduk, bugûn o kadar işim vardı yine de gidemedim.

ZİNO - İyi ettin amca, akşamdan beri çocuğun ağzından dûşmedin.

SADO - Biro otur kalk Zino'ya dua et ben biliyorum bu 11 sene dir neler çekti. Ama bugûn de maşallah aslan gibi bir efendinin annesi oldu. (Sado köylülere dönerek) Ve çocuklar bu bizim efendimiz, partilerin, şehirlilerin efendisine benzemez. Bu efendi Zino'nun tığının ucu, Biro'nun sapan demirinin ve kendi kaleminin efendisidir.

ZİNO - Allah bûtûn alemin de çocuklanm bağışlasın, gördûnûz amca, yedi tane çocuk soğuk toprağa gömdûm, bu kaldı.

SADO - Kızım Allah onu hem sana ve hepimize bağışlasın. Bile sin ki artık o yalnız senin oğlun değil hepimizindir. Bûtûn memleketindir. Bugûn memleketin oğlu inşallah yann memleketin babası olacaktır.

REŞO - Evet amca, cidden 5-6 sene önce Bursa'da askerdim. Orada bir köy vardı. Umur Bey'di.\* Köy değil bir şehirden güzeldi. Sordum, dediler ki: "Bu köyden bir çocuk okudu, bûyük adam oldu ve köyünû böyle yaptı."

SADO - Aha! Oğlum Reşo ben böyle demiyorum, onlar elin kesinden mertlik yaparlar. Bizimki emeğiyle bizi kurtaracak ve yalnız köylûsûne de faydası dokunmayacak. Ben de askerde gördûm, oradakiler milletin malını çalıp kendilerine, yakınlarına, şehir ve köyelerine harcarlar.

Şimdiki gençler çok iyidirler Reşo. Geçenlerde Diyarbakır'a gittim. Aşağı yukarı şehir iki parti olmuş. Biri gençlerin diğ-

ri de eski smrclerin. İy genlere komnist diyorlar.

KELOS - Amca, bu komnist nedir?

»Bu fey Trkiye'nin esfei reisicumhuru Celdi Bayar\*ın kydr.

41

SADO - Ne bileyim ođlum, kim kime kızarsa diđerine komnist diyor.

REŐO - Hele bu partiler bir Őeye benzemiyorlar.

SADO - ocuklar geenlerde Diyarbakır'da Belediye alanında CHP'nin mitingi vardı, eskilerin derisine ot doldurdular. Her krsye ıkan gen, keklik gibi okuyordu. Ne eskilerin hır-sızlıđını bıraktılar ne iltimaslarını ve ne de rŐvetlerini, inanın bir kusurlarını hasır altında bırakmadılar. Hepsini gzler nne serdiler.

BİRO - Ne, ne diyorlardı?

SADO - Yahu Biro, anlamıyorsun ne diyeceklerdi? Diyorlardı ki, eskiler halkı sevmezler. Kendi ıkarlarına bakarlar, akıllan yeni davalara ermez, onun iin iŐi genlere teslim etmek la-zımdır.

BEDO - Cidden dede benim de okulda birok Őehirli ve zengin beyođullan arkadaşlarım vardı, onlar da babalarından Őika-yetiler, kyl ve iŐilere ok acırlardı.

SADO - Elbette bize acıyacaklar ođlum, bilseler ki evlerinde ye-dikleri yiyecekte ne kadar emeđimiz vardır. Bođazlanndan lokmalan gitmez. MaŐallah Őimdiki genler hepsi melekler gibidirler.

Haydi ođlum syle bakalım, sen ne olmak istersin?

BEDO - Amca ben lisenin fen kolunu pekiyi derece ile bitirdim. Gerisini babam bilir.

SADO - Yok oğlum, baban fikri ne bilir, yine annen biraz daha iyi bilir. Fakat sen hepimizden daha iyi bilirsin.

BEDO - Bana kalsa ya doktor ya mûhendis olmak isterdim.

BİRO - Ne? Mûhendis mi dedin? Vallahi kabul etmem, o bûyûk şapkalılar neye yararlar? Ni kimseyi dövebilirler ne de kimse onlara birşey verir.

SADO - Ulan şu Biro'nun aklına bakınız, yahu bunlardan daha iyisi var mıdır? Biro'nun istediği dayak ve rûşvettir. Ulan akılsız, doktor ve mûhendisin rûşvete ihtiyacı mı olur?

ZİNO - Valla amca, eskiden beri ben de doktorluğu istiyorum. Çûnkû fakir fukara daima onlara dua eder. Amca o Diyarbakır'daki doktoru hatırlıyor musun?

42

SADO - Nasıl kızım, iyi insan unutulur mu?

BİRO - Bakın niye doktor, mûhendisten iyidir. O sene doğuştuk, önce onbaşıya sonra doktora götürdüler ve bu her ikisi ne dediyse diğerleri de onları dinledi.

SADO - Sus be Biro. Sen ne dediğini bilmiyorsun ulan. Onbaşı nerde doktor nerde?

ZİNO - İnanki amca bu adam hep böyledir. Az kalsın bir gûn başımı alıp bir yere kaçacağım.

SADO - Yok kızım, doğrusu Biro fena adam değildir. Fakat ne yapsın fakir. Kırk senedir tanınm. Ökûzlerin peşinde gidip gelmekten başka birşey yapmaz, yine iyi, sayende biraz uyanıdı.

ZİNO - Yok efendim, ben fakir ne bilirim ki!

REŞO - Hayır abla, hepimiz bilmiyor muyuz sanki.

SADO - Bedo oğlum, mûhendis olursan ne mûhendisi olacaksın?



BİRO - Mûhendis hep bir deęil midir? Őu yol yapanlar?

BEDO - Hayır baba; birçok çeřit mûhendislik vardır. Yol, yapı, petrol, elektrik mûhendisleri gibi.

SADO - Ben istanbul'da askerlik yaptım. Gemi mûhendisleri de vardı.

KELOS - Amca biz ne yapalım gemi mûhendisini? Öyle biri olsun ki hepimizin işine yarasın. Gemimiz var sanki?

SADO - Bedo oęlum, en son niyetin nedir?

BEDO - Amca valla, doğrusunu istersen ben su mûhendisi olmak istiyorum.

BİRO - Aha! Őaka olacak.

BEDO - Ne Őakası baba.

SADO - Ulan oęlum Biro, su mûhendisi gibi var mıdır? Bedo mûhendis olsun gelsin, Dicle ûzerinde bentler, barajlar kursun, suyu o yana bu yana çevirsin, bûtûn Diyarbakır ovasını sulasın sen yine Őaka de.

Ama bu Őaka o iki teneke su altında sûklûm bûklûm olan fakir Őaka deęildir.

REŐO - Dede, Dicle bu kadar derinden geçiyor. Onun suyunu nasıl ovanın seviyesine çıkarırlar?

SADO - Oęlum Bedo daha iyi biliyor ama hani beygil pirinçleri-

43

ni ekmek için nasıl Őûkûrû kaya gibi yapıp, bırakmıyorlar bir yudum başkasına gitsin, bu da böyle olacak. Fakat artık onun suyu yalnız beylere olmayacak. Diyarbakır ovasındaki bûtûn fakirler faydalanacak. Beylerin bu pirinçleriyle ocaklanmız sönüyor. Her sene kadınlarımız bebelidir ama çocuęumuz kalmıyor. Onlar pirinçlerini alıp gidiyorlar, sıtma ve hastalık

bize kalıyor.

KELOS - Vallahi yine beyler hile ile pirinçlerini ekecekler ve bu sefer bûsbûtûn çocuğumuz kalmaz.

BEDO - Kelos Amca o zaman hûkûmet beylerin elinde köy bırakmaz.

BİRO - Hûkûmet ne yapacak Bedo? Bu köyûmûzû kim beyden alır? Geçen sene Fate'nin oğlu kapısının önüne bir dut fidanı dikmişti, bey köye gelince eliyle söküp attı. Fate ağlayarak beye sorunca bey dedi ki: "Haydi ulan sen de, sonra yann oğlun demez mi, bu köyde bir ağacım var diye."

REŞO - Gûya beyimiz demokrattır, diyorlar. Peki amca eskiden beyimiz Halk değil miydi?

SADO - Tabii oğlum. Ama çoktan Demokrat oldu. Onlar öyledir; lokma nerde, onlar orda. Beyler sinek gibidir. Daima tatlıya konarlar.

BEDO - Baba, hûkûmet önce beylerden köyleri satın alacak.

BİRO - Ne ne! Bey köyünû satar mı?

BEDO - Ellerinde değil ki.

SADO - Dur oğlum Bedo, o senden anlamaz. Ben ona anlatayım.

Bakın diyorlar ki; önce hûkûmet köyleri hazine parası ile bey ve ağalardan satın alacak ve sonra da hûkûmet bize satacak, nasıl ki şehirlerde binaları alıp yıkıyor, yol meydan yapıyorsa, köyleri de öyle alacak.

REŞO - Peki amca hûkûmet köyleri bize satsa, ne ile alacağız?

BEDO - Amca, taksit ile size verecekler.

BİRO - Peki Bedo, bu taksit nedir?

SADO - Oğlum demedim mi senden alamazlar diye. Ulan taksit demek, kast demektir. Yani hûkûmet bize borç verecek, her

sene biraz vereceğiz, ta ki borcumuz bitinceye kadar. Ve böylece biz de arazi sahibi olmuş oluruz, beyler de haklarını al-

44  
mış olurlar.

KELOS - Ne hakkı amca, inan ki bu köy sahipleri, bu köylerin yansım hile ile ele geçirmişler, hepsi hükûmetin malıdır, onlara birşey vermese de haklıdır. Hırsızlık malı alınıp satılır mı hiç?

Sen daha iyi bilirsin. Ne zaman Serres köyü, Kerbetli, Beravi, Benoyi, Ruşvani, Ömer, Zivinge, Kune ve Şehbat normal olarak satılıp alınmıştır? Rahmetlik babam derdi ki, bûtûn bunlar zorla halktan alınmışlardır.

BİRO - Baba ben inanmam ki hükûmet köyleri beylerden alsın bize versin. Yüz kere gördüm bey ne kadar haksız olsa yine de onbaşı ve nahiye müdürü onları tutarlar. Şimdi nasıl kalıp da bu sefer köylerini alıp bize verecek? Bence de doktor daha iyidir.

ZİNO - Bence de doktor daha iyidir. Gördün mü Reşo geçen sene kızınız o kara yara hastalığı ile gitti. Peki doktor olsaydı ölür müydü hiç?

SADO - Bedo oğlum, unuttuyordum sahi, o kara yara hastalığının neden olduğunu demiyorlar mı? Bir aralık o ilaçlı buğdaydan olduğunu söylediler. Ses seda kesildi, acaba o buğdayı hâlâ veriyorlar mı?

BEDO - Evet dede, o buğdaydandır ve hâlâ da veriyorlar.

SADO - Gördün mü başımıza ne geliyorsa bu beylerin elinden geliyor. Hükûmet eksinler diye tohumluk buğday veriyor.

Fakat onlar ekmiyor satıyorlar.

Köyleri ellerinden alınmadan bunlarla başa çıkılmaz.

Hem ne diye köyler şehirlilerin olsun. Sanki hangi köylûnûn şehirde hanı apartımanı vardır. Köyler köylûnûn olmalı.

BEDO - Dede bir sordum dediler ki, hûkûmet hiç kimseye bir, bir buçuk tondan fazla vermiyor. Peki bu beyler nasıl oluyor da yûz, yûz elli ton alabiliyorlar. Mektepte şeyh oğlu bir arkadaşım vardı, babasının bu sene bankadan 200 ton buğday aldığını söylüyordu.

SADO - Kolaydır oğlum, beyler şimdi köylûlerin adını "dik kuyruklu" ve muhtar mûhrûnûn adını da köylû harmanlarını işaretlemek için tahtadan yapılan bûyûk "işaret tahtasına" çıkarıyorlar.

Onların tabirince bir kağıdı bu dik kuyrukluların ardından doldurup her birisine bir, bir buçuk ton yazıyorlar ve altına da muhtann mûhrûnû basıyorlar. Sonra da bu fakirleri traktöre doldurup bankaya götürüp orada da parmaklarını bir kağıda basıyorlar, bununla gûya herkes hakkını almış oluyor. Halbuki fukaralar gittikleri gibi geri gerisin traktörle köylerine dönüyorlar.

Sonra-köy sahipleri bunlara bir avuç buğday vermeden hepsini kendi hesaplarına satıyorlar. Başın için Bedo işte beylerin aldıktan 100, 200 tonlar hep bu hileler ile alınıyor. '

ZİNO - Allah yanlarına komasın inşallah.

BİRO - Zino'nun aklına bak. Kız vallaha bunlara birşey olmaz Allah karşı bunlar, kararmışlar, beddua da artık onlara tesir etmiyor.

SADO - Elimizde ne var oğlum? Kalkın ulan. Çocuklardan aynlamıyoruz

ama ge kaldık.

BEDO - Dede daha erkendir, neden kalkıyorsunuz, ne gzel konuŖuyorduk.

SADO - Allah seni bađıŖlasın ođlum, biz fakirler gzel olan ne grdk ki gzel konuŖalım? Bakma, istemiyorum seni ũzeyim. Yoksa bu yetmiŖ senedir grdklerimi aynen anlatsam akan sular dururdu:

nc perdenin sonu

46

#### DRDNC PERDE

Liseyi bitirdikten sonra, Bedo parasız İstanbul Dicle Talebe Yurdunda kalmıŖ ve tıbbiyeyi bitirerek doktor olmuŖtur. Sonra da Diyar-

bakır devlet hastanesine tayinini yaptırmıŖ ve gelip bir ev kiralayarak anne ve babasını da yanına almıŖtır

Sahne: Zino'nun Diyarbakır'daki evinin ayvanıdır. Zino bu ayvanı eskiden evlerinde hizmetilik ettiđi beyin ayvanı tarzında dŖemiŖtir.

İki yanına minderler konmuŖ ve orta yerde de bir masa vardır.

Sabahtır. Ođul, anne ve baba neŖe iinde kahvaltılarını yapıyorlar.

Kıyafetler:

Zino: Ŗehir tarzında yeni bir fistan giymiŖ, baŖına temiz bir namazlık rtmŖ, ayađında da bir terlik vardır.

Biro: Sakalı yeni tıraŖlı, baŖında kasket vardır. Yeni dikilen bir elbise giymiŖ, gmleđi de kıravatsızdır

Bedo: Kısa kollu beyaz bir gmlek ve tertemiz bir pantolon giy-

miştir.

Masının ûstû kahvaltî tabakları ile doludur. Zino Biro'nun bardağına çay doldururken perde açılır.

47

BİRO - Vallahi Zino ben bu kahvaltîdan bıktım, her sabah bayram gûnû gibi bu tabaklar arasında şaşkına dönûyorum.

ZİNO - Sana ne vereyim Biro, bûtûn şehir ailelerinde sabahlan bunlardan yenir.

BİRO - Şehirli! Biz şehirli miyiz? Nerede o soğuk ayran, yufka ekmeği? Keşke olsaydı da zararı yok arpa olsaydı.

ZİNO - Oğlum Allah aşkına babana bak. Yahu ben sana sac ekmeğini nereden bulayım? Bûtûn beylerin yediği bu. Tereyağıdır, peynirdir, reçeldir, zeytindir, çay ve fmn ekmeğidir. İyi olmasaydı beyler yer miydi?

BİRO - Ama yine beyler. Yahu Zino kimse senin iyini bilmez. Hem beyler iyi değil dersin, hem onlann yiyeceğini beğenirsin. Elbiseleri gibi yapmışsın. Köyde ne kadar rahattım, o geniş entari ve donumla isteğidim yere rahat oturabilirdim. Siz beni bu dar torbalara koydunuz. (Biro ceket ve pantolonunu Zino'ya göstererek) Beylerinki gibi olsun diye... Bedo oğlum Allahaşkma

böyle değil mi?

BEDO - (Neşeyle gûlerek) Ben ne bileyim baba, aslında ikiniz de haklısınız.

ZİNO - Oğlum ben Biro'ya sac ekmeği ve ayranı nereden getireyim?

BEDO - Anne Allahaşkına babam ne derse o olsun. Ne yerse, ne giyerse kendisi bilir. Onu beğenmeyen oğluna kızını...

ZİNO - (Gûlerek Bedo'nun kulağına eğilir ve yavaşça) Sahi Bedo o gûn bûyûk hanım bize gelmişti, hep seni konuştu, beyin kızı Fûgen bu sene okulu bitirmiş.

BİRO - Yahu bu Zino ne biçim kadındır? Ne zaman bûyûk hanım lafı açılrsa neşelenir, gûler ve benden saklar.

BEDO - Yok baba, mûhim değil. Anne benim Fûgen mûgenle işim yok. Ben Ayşoların, Fatolann oğluyum. Aşkım da siz ve hastalanırsınız. O fakir hastalar ki şimdi de hilelerle onlann derisini soymaya çalışıyorlar. Bazen bu Kara Yara'dan öyle hasta çocuklar getiriyorlar ki, sanki yûzûlmûşler, hiç vûcutlannda deri kalmamıştır.

Fûgen okulu bitirmişse artık bol bol kendisine ipekli elbise-ler diksin.

48

ZİNO - Ama oğlum, bûyûk hanım bu kadar zamandır senin için bekletti.

BİRO - Zino, yine mi bûyûk hanım?

ZİNO - Sus be... Sen ne bilirsin?

BİRO - Doğru söylûyorsun Zino. Birşey bilseydim, seni alır mıydım hiç.

BEDO - Anne babam...

ZİNO - Yok oğlum bu baban ateş olmuş, daima zıddına gider.

BİRO - Yalan, bûyûk hanım ve beygilin lafından başka neyine kanşmışım.

Kırk sene oldu, bunlar bir an dahi kulağımdan eksilmedi.

BEDO - (Bedo annesine duyurmadan ve yavaşça) Babam haksız değildir.

ZİNO - Siz bilirsiniz, bana ne.

BİRO - Nasıl sana ne. Vallahi herşeyden.

ZİNO - Biro, benim seninle alakam yok. Oğlum Bedo, sen o İstanbul'daki Dicle Talebe Yurdunu bize anlat. Ordaki talebeler hep fakirler mi?

BEDO - Evet anne. Hepsi fakir, Doğulu gençlerdi.

ZİNO - Peki oğlum, o yurt kimindi?

BEDO - Kimsenin değildi. İstanbul'da okuyan gençler kurmuşlardı. Ve sonra bûtûn işlerini de gençler parasız yaparlardı.

Bir de Doğu belediyeleri de biraz yardım ederdi. Ama ne yazık ki ziyaretgah kadar temiz olan bu yurt kapandı.

ZİNO - Yazık, peki oğlum, kapanmasına mani olamaz mıydınız?

BEDO - Evet anne, biz birkaç arkadaş da böyle dûtûndük ama, olmadı.

BİRO - (yavaşça ve gûlerek) Evet Zino. Senin bûyûk hanım da böyle yurtlar açarak fakir çocukları okutuyor!

ZİNO - Şuna bakın yahu. Peki sen de şimdiye kadar okuma iyi değil demiyor muydun?

BİRO - Benimki başka, bilmiyordum. Ama onlar mûnafıklıktan okumanın dûtûmanı oluyor. Kimseyi okutmuyorlar. Şayet bir fakir zorlukla okursa da, onu bûtûn kurnazlıklarını kullanarak aralarına almaya çalışırlar. Dara kalırlarsa kızlarını onlarla evlendirirler, yine içlerine alırlar. İşte şimdi de sıra bizde-

49  
dir Zino. Bûyûk hanımın zırt pırt ikide bir bize gelişi budur.

Fûgen mûgen de yine bu davadır.

ZİNO - Yeter Biro be! Bak oğlum sanki ne demişim ben.

BİRO - Ben olsam, bir Fermano'nın kızı, yûz Fûgen mûgenden iyidir.



BEDO - Sevgili anne ve babacığım, ben nasıl sûrûmden aynlınm. "Her kuş kendi sûrûsûne gerek" diyen bizim atasözümüz değil midir? Bilmez miyim ki sûrûden aynlan koyunu, ya kurt kapar, ya hırsız. Ben, Biro ve Zino'nun oğluyum, elbet eşim de ya Hace veya Zino olacaktır. Biz nerde, Fûgen nerde?  
BİRO - Oğlum, derler ki masal iyi değil ama, ben size kısa bir tane anlatayım.

Denir ki, bir gûn karga ile kelaynak aşık olur, nikahlanmak için Hazreti Sûleyman'a giderler.

Hazreti Sûleyman onlara der ki:

- Ben evlenme işlerine kaşmam. Kalkın benim çavuş kuşuma gidin. Nikah işlerine ancak o bakmaktadır.

Bunun üzerine neşeyle kalkarlar. Biri çavuş kuşuna vanp anlatırlar.

Fakat, çavuş kuşunun bu mûnesebetsizliğe akli ermemeğidir. Dili döndüğü kadar onlara nasihatta bulunur. Aşıklar bir türlü ikna olmazlar. Nihayet çavuş kuşu onlara der ki:

- Şu tepedeki kayalığı görüyor musunuz? Ona doğru bir koşu uçup tekrar dönün. Dönüşünüzde, karanım size bildiririm.

Aşık kuşlar uçmaya başlarlar. Karga, bir çırpıda kayalığa vanp hemencecik döner. Kelaynak ise uça kona, ancak çok sonra, işini bitirip huzura vanr.

Bunun üzerine çavuş kuşu - seyirleri aynı olmayanların nikahı caiz değildir diyerek kati kararnı bildirir.

ZİNO - Gördün mü oğlum, babanın canının istediği şeylere akli nasıl da eriyor. Bana ait hususlara da akli böyle erse birşey demezdim.

BİRO - Kız Zino, sana ne yaptım? Kırk senedir aleme çalış didin. Başta akıl mı kalır? Bazen aylarca iki öküzûmden başka insan yûzû mû görûrdûm? Hatırlarsın ki bahar gelince uykuya

50

mahrum kalırdım. Gûnlerce eve gelmezdim. Bir keresinde eve geldiğimde, Bedo'nun bûyûğû olan oğlumuzu sorduğumda gömûlmûş olduğu cevabını almıştım.

(Zino Biro'nun eski gûnleri hatırlamasından kaçınıyor. Gözleri yaşla doluyor. Annesini böyle ağır gören Bedo, boynuna sarılıp öpmeye başlıyor.)

ZINO - Yeter be Biro, sen hep böylesin, ne yapalım? Bedom sağ olsun.

BİRO - Sözündûr Zino. Haklısın.

BEDO - (Gûlerek) Maşallah, görûyorum, artık anlaşıyorsunuz.

ZİNO - (Mahcup) Yok oğlum, ama ne yapalım. Babandır.

BİRO - (Neşe ve gururla bıyıklarını sıvazlayarak) Vay babam. Ūstelik Zino oğluma minnet ediyor.

BEDO - Ama annem değmez mi?

ZINO - Ne minneti oğlum, babanın işidir işte.

(Kahvaltıları bitmiş. Bedo annesine sofrayı toplamakta yardım etmektedir. Biro sigarasını sarmaktadır. Bu sırada avlunun kapısı açılır. Entarili, kofili, yırtık başörtûlû, kara yaralı bir çocuğu sırtında taşıyan fakir bir kadın girer.)

HANSE - Doktorun evi bu mudur efendi?

BEDO - Evet anne, burasıdır.

HANSE - Hayna bana doktoru çağır, oğlum.

BEDO - Doktor benim, anne.

HANSE - Benden vazgeç oğlum, ben fakirle alay etme. Görûyor-

sun çocuđum hasta, Őakanın sırası mı?

BEDO - Ne alayı anne. Benim doktora benzemeyen tarafım ne?

Doktor benim iŐte.

HANSE - Hayret!.. Peki Kûrt doktor olur mu?

BEDO - Var ya. İŐte ben.

HANSE - Ama babam... Çok bûyûk bir doktor olduđunu söylûyorlardı.

BEDO - Ne söylemişlerse benim için demiŐler.

51

HANSE - Allaha Őûkûr, demek artık bizden de doktor çıkıyor.

(Çocuk hâlâ Hanse'nin sırtında durmaktadır. Hanse sevinçle karışık bir hayret içindedir. Bir taraftan dualarını sıralamakta, öte yandan çocuđu sırtından indirmeye çalışmaktadır. Zino bu manzara karşısında kendini eski haliyle dûŐûnmektedir.)

ZİNO - Evet kızım evet. Niçin Kûrt doktor olmasın ha!... Okuyan herŐey olur. Kimsenin kimseden ûstûn tarafı yok. Yeter ki okusun.

HANSE -Ama anne!.. O sene hûkûmet bizim köyde mektep yapmak istedi de, köy sahibimiz mûsaade etmedi. Dedi ki: Kûltten birŐey çıkmaz, okuyup da ne yapacaklar?

BEDO - Yok abla yok, onlar hep yalan söylerler.

HANSE - Peki ođlum, peki, sana kurban olayım.

ZİNO - Hayrola kızım, derdin nedir?

HANSE - Derdim Őu ođlanın hastalıđıdır anne.

BİRO - Haydi Zino, kadıncađız ayakta kurudu, otursanıza.

ZİNO - Haklısın Biro, otursana kızım.

(Hanse tereddût ve mecburiyetle çocuđu çözmeye başlar ve Bedo'nun bakması için hazırlar.)

HANSE - Peki... Hepinize kurban olayım.

(Bedo, bezler arasında bir maymun yavrusuna dönmüş olan ve kara yaradan bûtûn vücudu paramparça olan çocuğun elinden tutar.)

BEDO - Demek bu güzel çocuk hastadır ha. Bakalım hele. Yok yok, korkacak birşey yok. Ben senin ağabeyimim. Şu minik ellerini ver bakalım. O... maşallah birşeyi yok. Yann hastahaneye getirin inşallah birşeyciği kalmaz.

HANSE - Aman doktor bey, çok rica ederim burada bak. İnan ki dört yavrumu gömdüm, bu tek kaldı. Diyorlar ki hastahanelerde iyi bakmıyorlar.

52

BEDO - Yok abla yok. Yalan söylüyorlar. Esasen hastahane fakir fukaranın yeridir. Oradaki doktor yine benim.

ZİNO - Oğlum, Hanse ablan doğru söyler. Hepsi senin gibi mi sanki? Zaten dediğin şeyler yüzünden, fakirlerin gözleri hastahanelerden korkmuştur.

HANSE - Bak doktor bey, elim boş değil ha. Senin ve bu tek yavrumun başı için ilbahardan beri yumurta sattım ve bir de tavuğum vardı, onu da on meciyeye verdim, hemen hepsi on dokuz lira yaptı. İki benim ve eşeğimin han parasına yeter, gerisini de sana vereceğim. Olsun, evladım kurtulsun da zaran yok, hepsi feda olsun.

BEDO - Yok abla yok, oğluna parasız bakacağım.

HANSE - Herhalde azdır diye almıyorsun. Ama ben fakirim ne yapabilirim. Fakirliğin gözû kör olsun. Siz görmemişsiniz, bilmezsiniz, fakirlik çok zordur kimse görmesin.

(Yine Zino eski hayatını hatırlar, mendilini çıkarıp ıslanan gözlerini siler.)

ZİNO - Yok kızım, İnankiaz olduğu için değil, yavrum esasen kimseden para almaz.

HANSE - Allah beni sana kurban etsin. Peki hala doktor neyin oluyor?

ZİNO - Oğlumdur.

HANSE - Allah onu sana ve bize bağışlasın. Haydi öyleyse gidelim, yann hastahaneye gideceğiz.

BEDO - Nereye gideceksin abla?

HANSE - Sağolun, konağım vardır. Hancıya iki mecdiye verdim. Biri benim için, diğeri de eşeğim için.

BEDO - Ne ne!.. Han mı, bu hasta çocuğu nasıl hana götürülecek-

HANSE - Ne yapalım oğlum, biz fakirlerin şehirdeki konağı han-

(Bedo yavaşça annesiyle konuşur.)

53

BEDO - Anne bu akşam bizde kalsalar?

ZİNO - Cidden, kızım bu akşam yanımızda kabanız?

HANSE - Estağfurullah, kölenizim ben. Evinize gelecek adam mıyım hatun?

ZİNO - Yok kızım, zaran yok, bak doktorunuz da istiyor.

HANSE - Nasıl olacak! Başınıza kurban olayım. Ama eşeğim handadır.

ZİNO - Ne olur kızım, git eşeğine bak, hancıya tembih et ve gel.

HANSE - (Çocuğun çer çöpûnû sararak) Haydi kalk Silo, sırtıma gel ki gidelim.

ZİNO - Adın nedir, kızım?

HANSE - Hanse'dir, hatun.

ZİNO - Kızım Hanse, istersen çocuğu götürme. Daha çabuk gelirsın.

HANSE - Evet hatun. Cidden han da uzaktır. Öyle ise otur oğlum Silo, ağlama. Ben şimdi gelir sana buğday ekmeđi getireceđim.

SİLO - Anne doktordan korkuyorum, beni de götür.

HANSE - Korkma ođlum korkma. Doktor çok iyidir, o da bizdendir.

SİLO - Çabuk gelecek misin anne?

HANSE - Şimdi geleceđim. Otur kendi kendine oyna. Sana ve ona kurban olayım.

(Hanse gittikten sonra, Bedo sandalyesini hasta çocuđun yanına getirerek sevmeye başlar.)

BEDO - Peki gûzel çocuk, adın nedir bakalım?

(Silo önce utanarak yûzûnû doktordan saklar.)

BEDO - Haydi ođlum korkma, ben amcanım yavrum.

SİLO - Silo'dur.

BEDO - E, Silo'cuk, peki baban yok mudur?

SİLO - Niye olmasın. Beygilin uşadıdır.

BEDO - Ha! Evet tabii, ne olacak fakir? Peki Silo, şeker istemez misin?

54

(Doktor bir avuç karamela şekerini Silo'ya verir, Silo renkli şeyleri doktorun elinde görûnce, korku ile iki eliyle ađzını kapar.)

SİLO - Yok yok, valla yemem, ilaçtır.

BEDO - Korkma ođlum, inanki şekerdir. Bak ne kadar hoştur.

SİLO - Yok yok babam! Niye, şeker böyle midir?

BEDO - Peki şeker nasıldır Silo?

SİLO - Vallahi beyin evinde şeker gördüm, beyazdı.

(Bu sefer doktor birkaç tane çay şekerini getirek Silo'ya gösterir.)

BEDO - Bu muydu Silo?

SİLO - Evet onun gibi idi.

BEDO - Doğrusun Silo ama, bu da şekerdir. Haydi gel, beraber yiyelim.

(Doktor önce bir karamela, sonra da bir kesme şekerini yer. Silo da onun gibi yer.)

SİLO - Vay, cidden tadıdır. (Ve doktorun elindeki bütûn şekeri kaparak boynuna koyar.)

BEDO - Haydi ye, gûzel Silo.

SİLO - Yok valla yazıktır, yemem babama götüreceğim.

ZİNO - (Melûl melûl onların bu halini seyreder) Silo oğlum, kardeşlerin yok mudur?

SİLO - Nasıl yoktu, iki erkek, üç kızkardeşim vardı, hepsi öldü, yalnız ben kaldım.

BEDO - Peki Silo bunu yemez misin?

SİLO - O nedir?

BEDO - Portakal.

SİLO - Portakal nedir. Yok valla şemamedir.

BEDO - Okun Silo, al ye de.

SİLO - Yok valla yemem. Onunla oynayacağım. Şemame yenir mi?

BEDO - (Ûzûlerek yavaş yavaş ve kendi kendine konuşarak) Evet Silo, elin yiyeceği senin için oyuncak oluyor. Daha sen on-

55

lann yiyeceklerini tanıımıyorsun bile.

ZİNO - Oğlum Bedo, herhale Silo'yu çok sevdin?

BEDO - Nasıl sevmeyeyim anne? Bu bir avuç deri kemik kalmış insan yavrusu bana neler hatırlatmaz. Onun memleketimizden farkı ne? Fakir, çıplak, hasta ve yûzûlmûş. Peki anne niye beni okuttun? Neden Dicle yurdu beni bağnna bastı? Benim de bu soygunculann arasına katılmam için mi? Silolan sevip, onlan bu feci durumdan kurtarmam için değil miydi?

ZİNO - Tabii oğlum tabii. Allah seni bağışlasın. Elbette seveceksin. Bûtûn kardeşlerin de bu feci durumdan ölmediler mi?

BEDO - Gûven anne, bugûn pazar ama hastalanm beni bekler, hastahaneye uğrayıp geleceğim. Silo sen de ağlama, şekerini ye, oyna e mi.

SİLO - Git ama çabuk gel. Geç kalırsan ağlanm.

BEDO - Başûstûne Silo.

(Bedo ceketini giyip, çantasını alarak çıkar gider. Zino, oğlunun arkasırından hem bekar, hem de gözyaşı döker. Fakat ağladığını Silo'dan saklar.)

ZİNO - Peki Silo, oğlum, söyle aç değil misin?

SİLO - Hayır yedim.

ZİNO - Ne yedin Silo?

SİLO - Annem bana buğday ekmeği satın aldı.

ZİNO - Başka?

SİLO - Yetmez mi, daha bana ne alacak?

ZİNO - (Zino yiyecekleri tepsinin üstûne koyarak Silo'nun önûne koyar) Haydi bir daha ye yavrum.



SİLO - (Sofrayı yanına çekerek) Yok valla yemem. Anneme saklıyacağım.

ZİNO - (Bir yandan gözyaşlarını siler, bir yandan da Silo'ya yalvarır ki bir şey yesin) Sen şimdi ye, annene de var yavrum. (Ve Zino sofrayı yine Silo'nun önüne çeker. Silo sofraya bakar, fakat sofradaki yiyeceklerin hiçbirini tanımaz.)

SİLO - Bu pekmez mi?

56

ZİNO - Yok oğlum, reçeldir

SİLO - (Tadına bakarak) Vay bu da şekerdir. Ne kadar şekeriniz var yahu? Peki bu içindeki kabuklar nedir?

ZİNO - Kabuk değil, kaysıdır oğlum.

SİLO - (Peyniri eline alır, bakar ve tekrar tabağa koyar) Bu cacık mı? Ben cacık yemem.

ZİNO - Cacık değil oğlum peynirdir.

SİLO - Öyleyse kurttur. Annem de komşulardan ayran getirir bize yapardı. (Silo'nun ürkmemesi için onu fazla zorlamaz ve dediklerini yapar. Silo zeytine de bakar, tanımaz, bir tanesini ağzına alır, fakat yemeden yere atar) Ööööf, bunlar nedir?

ZİNO - Zeytindir yavrum, haydi ye bakalım.

SİLO - Yok anne, valla bunlar yabancı harnuplardır.

ZİNO - Peki et de yemez misin?

SİLO - (Eti tanır) Evet bu ettir. Geçen sene bayram gûnû kahyanın evinde yemiştım. (Ve elle bir parça et alarak şuursuzca yemeğe başlar)

ZİNO - Ye oğlum ye. Sılocuğum su istemez misin?

SİLO - Evet isterim.

(Zino bir bardak su getirir. Silo her iki çıplak eliyle bardağa ve

tuhaf tuhaf suya bakar.)

SİLO - Suyunuz ne kadar beyazdır! Yoksa bu da su değil şeker midir?

ZİNO - Yok oğlum yok. Sudur. Niye, sizin ki böyle değil midir?

SİLO - Nerde, annem kuyudan getirir bep bulanıktır. Sonra biz suyu böyle parlak birşeyde içmiyoruz.

ZİNO - Siz neyle içiyorsunuz akıllı Silo.

SİLO - Annem Diyarbakır'a on yumurta gönderdi, bize kulplu bir Amerikan tenekesini aldılar. Biz onunla içiyoruz. Ama o bunun gibi parlak değildir.

(Doğuda Amerikalıların içindekileri yiyip attıkları konserve kutularını halk lûks kap kaçak diye kullanır Bu sırada avlu kapısı açılır, içeri bir genç girer ve Zino'ya sorar:)

57

GENÇ - Hanım, doktorun evi bu mu?

ZİNO - Evet oğlum, budur neden?

GENÇ - Birkaç köylû anyor, hastaları var, kapıda tabelası olmadığı için bulamıyorlar.

ZİNO - Oğlum, diğer doktorlar gibi evde muayanehanesi yoktur. Yalnız hastahande hastalarına bakar. Onun için tabela yapmamıştır. Ama haydi söyle içeri girsinler bakalım.

(Köylûler ve hastalar avluya girerler. Eski köylûleri olduğu için onları tanır.)

ZİNO - Aa, Gûle kardeş siz misiniz, hayırdır inşallah.

GÛLE - Ne hayn kardeş. Memo'yu doktora getirdik.

ZİNO - (Yorganın içindeki çocuğa bakarak) Hayret, Memo mu bu hale gelmiş?

GÛLE - (Ağlayarak) Ah anne, hele diğerlerini göreydin, hiç ol-

mazsa bu daha canlıdır. Diğer ûçû öldû. O senin çok sevdiğin çocuk da öldû.

ZİNO - Peki niye şimdiye kadar kaldın yahu?

BUHARE - (Gûle'nin kızkardeşidir, beraber gelmiştir) Zino bacı gördün elimiz boştu, ayıptır dedik.

ZİNO - Bûhare'ye bakınız yahu. Kız ayıp değil mi böyle söylüyorsun. Bedo parayla mı size bakacak? Bak duymasın ha.

GÛLE - Kardeş, şehirdir ne yarsan para lazım oluyor. Biz şehre gelir gelmez, biri bir makbuz keserek bizden iki mecrediye aldı. Adet böyle imiş. Her hayvanla şehre gelenden alırlarmış. Hana gittik, o da öyle.

ZİNO - Peki Gûle bacı, ayıp değil midir evin varken hana gidiyorsun?

BUHARE - Ama kardeş bu halimizle nasıl doktorun evine gelebiliriz?

ZİNO - Yok Buhare, Bedo'nun başı için benden fazla misafir istiyor. (Siloyu göstererek) Bakın biraz ewel bu çocuğun annesi de geldi. Hana bırakmadı, burda misafir etti.

GÛLE - Allah onu sana bağışlasın.

58

(Bu sırada Biro dışarıdan gelir. Kadınlar onu görür.)

BUHARE - Bak Zino kardeş, Biro abim geliyor.

BİRO - (Kadınlara) Hoş geldiniz çocuklar (ve hasta çocuğa bakarak) Vay evladım, Memom mu bu hale girmiş?

GÛLE - (Ağlayarak) Evet abi. Ya diğerlerini sormuyorsun.

BİRO - Kalanlar sağolsun. Peki niye Halo gelmedi?

BUHARE - Gelemezdi ki ağbi, çift zamanıdır. Kahya bırakır mı?

BİRO - (İçini çekerek) Evet bırakmaz. Başım gözüm üstüne gel-

diniz. Zaran yok.

(Tam o sırada Silo'nun annesi de gelir.)

ZİNO - Gel kızım Hanse gel. Bak Silo'yla ne kadar dost olduk.

HANSE - Kölendir hatun. İnşallah seni ûzmemiştir.

SİLO - Yok valla anne, ağlamadım. (Ve koyundan bir avuç şeker alarak annesine verir) Bak doktor bana ne verdi. Ama ben yemedim, sana ve babama sakladım. Anne burası evimizden çok gûzel be, herşey var. Hele sulan ne kadar gûzeldir. Hem beyazdır, hem de soğuktur.

HANSE - Peki oğlum peki. Allah ziyade etsin. İşte doktor da geldi.

BEDO - O... maşallah, annemin cemaati toplanmış.

ZİNO - Oğlum Bedo tanıdın mı? Gûle ve Buhare halalarıdır.

BEDO - Evet anne, tanıdım. Hoşgeldiniz halalar. Hayırdır inşallah?

GÛLE - Ne hayn oğlum, mahfolduk. Çocuklanm kalmadı.

Memo'yu sana getirdim. Bak ne esarete dûştûm.

(Bedo ûzûntûyle çantasını bırakır. Bir elle Memo'nun elini tutar, diğeriyle Silo'yu okşat Biro, Zino ve diğeri misafirler onlara bakar.)

BEDO - Evet çocuklar, mahf olduk fakat artık mahf olmayacağız.

Dördûncû perdenin sonu

59

KARA YARA

\*\*

BIYANÎ

Albert Camus

NÛDEM

Pirtûka Biyanî li dora ramana absurdê digere. Ew beşê

pêşî ji dîtinên Albert Camus li ser mirov 0 li ser bêmaneyiya dunyayê bi gewde dike. Qehremanê pirtûkê. bêyî ku bi 7-anibe, jiyaneke bêmane dijî. Lê rojekê. gava pirs "çima?" ji xwe dipirse. ew bi rastiya vê bêmaneyiyê jî dihese. Bersiva vê pirsê rastiyeke mezin di rûyê wî de vedike û wilo jî valahiyeke mezin di nava wî de peyda dibe. Lê ev mirovê han ji qedera xwe nareve û bi ser de jî ew bêtir ji jiyana pûç hez dike. Ji ber ku ew bi ser rastiya tiştan ve dibe. ew dibe mirovekî biyanî. Di mala xwe de. di bajarê xwe de ew xwe kesekî biyanî û bêpêwendî dibîne.

Weşanxaneya me vê romana ku beşê wê yê pêşî di kovara NÛDEMê de hatibû weşandin. bi serbilindî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Albert Camus

BIYANÎ

A A Weşanen NUDEM

Albert Camus

BIYANI"

Roman

Wergera ji firansî: Dr. Fawaz Husên

• A Weşanen NUDEM

W~anên NÛDEM: 13

Biyani

Navê orjînal: L'Etranger

çapa Yekem: Stockholm 1995

@ Editions Gallimard, 1942

@ Wergera kurdî: Weşanên NÛDEM 1995

Pergala berg û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Magritte

ISBN: 9188592-138

Mare vê wergera kurdî ji aliyê W~anên Nûdemê ve ji W~anxaneyê Gallimardê hatiye kirîn.

Ev werger bi destûra weşanxaneyê Gallimardê hatiye çapkirin

Albert Camus

(1913-1960)

Camus demeke kurt li ser diyê erdê diji. Lê di vê jiyana kurt de, ew pirsên

herî girîng il serekîn li ser meneya mirov il çîhanê ji xwe dike. Di çarçefa

van pirsên girîng il jiyana xwe ya zehmet de, Camus berhemên xwe ava dike

il nêrînên xwe bi nav dike.

Albert Camus li Cezayirê li bajarê Modoviyê li herêma Konstantînê ji

diya xwe dibe. Bavê wî di sala 1914<IDde dimire (I Albert biçilkaniyeke pir

perîşan li taxeke zîvar il gelêrî ji taxên serbajarê Cezayirê bi diya xwe re

derbas dike. Di şanzdehsaliya xwe de ew bi nexweşiya jana zirav dikeve. Lê

li gel zîvarî il nexweşiyê ew xwendina xwe ya navîn il paşê jî ya bilind bi

serbilindî derbas dike. Camus dixwaze bijî, bizanibe ka doza mirov di cîhanê

de çî ye, çî giring e, çî pilç il bêmene ye. Hemil şêweyên hizrê bala wî dikişîn il ew dikeve nava jiyana rewşenbîrî, bi karê şanoyê radibe,  
dest bi rojnamevaniyê dike, dibe endamê partiya komnîst il ji bo azadîbîyîna  
gelê musulman xebatê dike. Camus piştî salên xizaniyê bi taya jiyânê  
dikeve il dixwaze zincîra zîyarî il neçariyê bişikîne, dilê xwe bide ber roka  
havînê il pêlên perava deryayê il xweşiyê. Ew ê derengtir bêje ku ew gotina  
azadiyê ne ji Marks hîn bilye lê ji tengasiyên jiyana xwe. Di van salên pêşîn  
de ew Rû û Pişt (1937) il Şadiyên Zewacê (1938) dinivîsîne. Piştî zarotîtiyeke  
zehmet, ew bi van herdu pirtfikan evîna xwe ji jiyânê re diyar dike. Gava Cenga Duwemîn dest pê dike, Camus dixwaze şer bike, bibe leşker,  
lê ji ber nexweşiya wî, daxwaza wî bi cîh nabe. Di sala 1940î de, ew Cezayirê il Afrîqa Bakur li dil xwe dihêle il berê xwe dide Parîsê.

5

Albert Camus her gav li ser zehmetiyên jiyânê dirame, bi dirêjayî difikire.

Li Parîsa şikestî, ew aloziyên serdemeke pir têkel û dijwar dibîne.

Wilo  
jî, nêrînên wî li ser pûçiya jiyânê hin bi hin xurtir dibin û ciyekî mezin di

nav ramanên wî ên felsefl de digirin. Ew di Parîsa bindest de bi valabûna jiyane dihesse û Biyanî dinivîse. Fikira vê romanê bi xwe ji mêj ve di serê wî de ye; Camus ji sala 1937an de dixwaze tiştekî wilo binivîse. Li Parîsa di . bin destê faşîstên Hitler de, ev pirtûkî sala 1940ê de bi gewde dibe û di 1942an de çap dibe. Camus esseyekê bi navê Afsaneya Sisyphe bi vê pirtûkê re çap dike, weke ku dixwaze ku ew tiştekî bi tiştekî din bide rohnak û xuyakirin. Ew paşê du şanoyan: Şifl[têgihfl[tin (1944) û Ca/igu/a (1945) dinivîsîne. Hemû berhemên vê demê li dora milê pûçiyê digerin. Piştî pûçiyê rêyeke din li ber Camus vedibe û tevger û berxwedana mirovan di rayê aloziyên jiyane de meneke din di serê wî de distînin. Camus di nav jiyana xwe ya rewşenbîrî de rê dide serdemeke nû : serdema mirovê ku serê xwe bilind dike. Ew anuha dibîne ku giring e ku mirov meneyekê bidin hebûnaxwe li ser rayê erdê. Mirov gerek destên xwebidin hev û di rûyê napakiyê de rawestin. Di rûyê bêdengiya Xwedê û dunyayê de, qehrmanên pirtûka Weba (1957) di rayê rencê û bayê hovitiyê de xwe dikin



yek û dawîya dawîn bi ser dikevin. Camus pesnê berxwedanê,  
tevgera civakî  
di Mirovê serîhilda (1951)de jî dide.  
Lê pêwendiyên di navbera mirovan de herdem pewendiyine  
zehmet in,  
Camus di vê yekê de xweş digihêje û pê dêşe. Rewşenbîr nikare bi  
jiyanê  
re bingehên danûstandinên xurt saz bike. Hîsa gunehkarî û  
naçariyê roj bi  
roj mezintir dibe. Hunermend dunya dora xwe fêr nake û bêgav  
dibe  
bar bike, bide ser rêya surguna hundirînî. Camus di sala 1957ande  
Xelata  
Nobelê li Stockholmê digire û di gotara xwe de dîsa li ser pirsê  
şaşîtiyê, li  
ser surgun û tenhayiya mirovê rewşenbîr diaxife. Ew nivîsên xwe li  
ser Cezayirê  
di Nûçeyên Teze de berhev dike lê ev pirtûkgelekî deng nade û di  
6  
nav sersariya mirovan de zû tê ji bîr kirin. Camus xwe ji bo  
romaneke nû  
amede dike dema trumbêla wî ji ser rêya xwe derdikeve, dide ser  
rêya mirinê.  
Gelo ev rêya nûbi dilê Camus ye? Bersiva vê pirsê zehmet e ji ber  
ku  
Camus gelekî di nivîsên xwe de behsa pûçiya dunyayê dike û  
pesnê xwekuştinê  
dide. Ew bi dirêjayî li ser vê pirsê ramiyaye, nexasim di Efianeyê

Sisyphé de. di xuşka cêwî ya pirtûka Biyanî de. Camus di sala 1960î de di çel û heftsaliya xwe de mîna çirakê vedimire. Mirov dikare anuha ji xwe bipirse çima ev pinûka biçûk wiqasî deng da û bi sed caran hat çap kirin û wergerandin? Bêtirî pênd salî piştî derketina wê li weşanxaneyê Gallimardê, ev pinûka hêna bala rewşenbîr û hemû xwendevanan bi xurtî dikişîne û hêna tê wergerandin. Çima? Çi di vê pirtûkê de heye ta ku ew bibe berhemek di nav bernameyên xwendegên biçûk û bilind de? Çima ew bûye berhemeke cihanî, geytî? Bersiv bêguman e dirêj be lê mirov dikare bi kurtî bibêje ku berdwama vê pirtûkê bêguman bi hunermendiya Camus û bi nêrînên wî liser pirsar pûçiyê girêdayî ye. Her yek jî dikare rojekê ji rojan xwe di Meursault de bibîne. Her yek ji me dibe ku rojekê xwe biyanî di nav kesên biyanî de û di çîhanê de bibîne. Kî dizane, belkî her yek ji me gelek caran di temenê xwe de wek Meursault dixwaze xwe di nava "Sersariya dilovan ya çîhanê de" ji bîr bike. De. Fawaz Husên

7

8

Ez vê wergerê diyan Hêwa M. ûHesenê Metê dikim.

FawllZ Husên

Beşê Yekê

1

Îro dayê mir. Belkî jî do bû. Ez nizanîm. Ji mala pîran ji min re telegrafek

hat: "Dayikê wefat kiriye. Veşartin sibe ye. Silavên bijartî".

Maneya vê yekê tune. Ew belkî do bû.

Mala pîran li Marengoyê ye, heştê kîlomitô dû serbajarê

Cezayirê

ye. Ez ê saet dudyan li otobusê siwar bim û piştî nîvro bigihê

wê. Ez ê wilo jî bikaribim li ber laşê diya xwe şevê bimînîm û

sibehê

êvarê vegerim malê. Min du rojên bêkaô ji xwedanê karê xwe

xwestin

û ji ber behaneyek wilo mezin wî nikaobû bigota na lêbelê ew

ne bikêf xuyabû. Min jê re jî got: "Ev ne sucê min e." wî dengê

xwe nekir. Ez piştî fikiôm ku ne gerek bû ku min ew yek di rûyê

wî de bigota. Lê bi çend gotinên kurt, ne li min bû min bexşîn û

buhuôn jê bixwestana. Gerek wî ji ber xwe ve di ber dilê min de

bida,

bigota bera serê te sax be. Lê bêguman ew ê van tiştan dusibe ji

min re bêje dema ê bi çavên serê xwe bibîne ku ez şîniyê

dikişînim.

Anuha mirov dikare hinekî bêje wek ku dayê hêna ne mirî ye. Piştî

veşartina wê, ev yek bi giştî ê bê guhertin. Mirina dayê wek serhatiyekê

ê ciyê xwe bigire û her tiştê ê têkeve qalîkekîbêtir resmî û bi rêk û pêk.

Ez saet duduyan li otobûsê siwar bûm. Dunya gelekî germ bû.

Min li aşxanê li bal Cêleste wek her carê fravîna xwe xwar. Li wê derê hemû li ber min diketin, dilê xwe bi min şewitandin û Cêleste ji min re got: "Deh diyên mirov tunene, tenê yek heye" ..Dema ez rabûm ser xwe herim, ew hemû bi min re ta ber devê deo hatin. Min xwe hinekî gêj kiribû û gerek ez hilkişyama bal Emmanuel û 9

min ê graîetek reş û bazûbenda şîniyê ji wî deyn bikirana. Apê wî berî çend mehan miribû.

Ta ku otobûs li min neçûya, min ta îstegeha wê bazda. Bêguman ji ber vê bezê û bi ser de jî ji ber hejandina otobûsê li ser rê, bêhna benzîne û şewqa li ser rê û li asmanan, ez xulmaş bûm û nêzîkî hemû

dirêjayiya rê ez razam. Dema min çavên xwe vekirin, min dît ku ez bi ser xwe de li kêleka leşkerekî hatibûm guvaştin. Yê leşker bi min re kenîya û ji min pirsî ka ez ji dûr ve dihatim. Min got "erê" ta ku min rê ji axiftinê re vekirî nehişt.

Mala pîran du kî\omitran ji gund .dûr e. Min da ser rê û ez peya çûmê. Dema ez gihastim wê derê min seraser xwest diya xwe bidîta.

Lêbelê yê dergevan ji min re got ku pêşî gerek min serde bîr ango berpirsiyarê navendê bidîta. Ew wê gavê ne vala bû û min hinekî xwe li hêviya wî ragirt. Dergevan di wê wextê giştî de devê xwe vekir

û nema girt û di serê min de kir pitepit û piştire min serdebîr dît.  
Ew li nivîsgeha xwe hat pêşiya min. Ew kalekî hûrik e bi Nîşana  
Civaka

şeref! ye. wî bi çavên xwe ên zelal li min nêrî. Piştire wî destê  
min di nav destê xwe de demeke dirêj hişt û guvaşt û min nema  
dizanîbû

çawa ew ji nav destê wî bikişanda. wî li dossierekê, li kirasekî  
kaxez û belgehan mêze kir û ji min re got: "Ev heyê sê sal ku xa-

..

nima Meursault ketiye vê derê. Ji te pêve tu negehdar û tu piştine  
din ji wê re tunebûn". Min bawer kir ku wî bi wan gotinan gazina  
tiştinan ji min dikir û min dest pê kir jê re rave û rohnak kir lê wî  
gotina min birî û got: "Lawê min ê delal, ne giring e tu ji min re  
bibêjî çima. Min dossiera diya te xwend. Te nikarîbû ew xwedî  
bikira.

Ji wê re nexweşnêrek, hemşîreyek divat û tu bi xwe tu perên wilo  
pir nastînî ta te ev yek bikira. Paşê, eger bê ya dawî, çawa be ew li  
vê derê bêtir bikêr bû. Min ji wî re got: "Erê ezbenî". wî gotina  
xwe bêtir ajot: "Tu dizanî, ew li vê derê ne bê heval bû, ez  
dixwazim

bêjim hevalên di salên wê de. Wê dikaribû bi wan re li ser gelek  
tiştan li hev bikira, li ser tiştine ji çax û demine din. Tu genc î û ew  
bi te re bêguman aciz û dilteng dibû."

10

Ew yek rast bû. Dema dayê bi min re li malê dijiya, wê tişteki  
nedikir

hema bi çavên xwe bi bêdengî ez bi kuderê diçûm dida dû

min. Dema ew ket mala pîran, di rojên pêşîn de ew gelek caran digiriya.

Lêbelê ew tenê ji ber xwîbûyîne digiriya, tenê ji ber ku ew hêna hînî wê derê nebûbû. Piştî çend mehan, eger ew ji mala pîran

bihata derxistin, ew ê dîsa bigiriya, herdem ji ber adetê, ji ber xwîbûyîoê.

Hinekî ji ber vî tiştî jî di sala dawîn de pir kêin caran nigên min bi wê derê ketin. Ji ber xwîbûyîoê û ji ber tişteki din jî ez pir kêin çûm wê derê. Erê, her ku ez diçûm dîtina wê hemû yekşema min li erdê diket.- ez hesab nakim ew zora ku min li xwe dikir diçûm

ta otobûsê, bilêtên ku min dikirin û ew herdu saetên xwe ku min bi rê winda dikirin.

Yê serde bîr hinekî din bi min re deng kir lê ji sedî min carekê li wî guhdaî dikir an nedikir. wî piştî ji min re got: "Ez gliman dikim tu dixwazî diya xwe bibînî." Bê ku min tişteki bigota ez rabûm ser xwe û wî li pêşiya min berê xwe da deri. wî Li ser pêlikan ji min re rave kir: "Ta em li kal û pîrên din kêr nekin û wan netirsînin, me diya te biriye oda me ya biçûk ya ji bo cendekan. Her cara ku yek ji nav wan li bal me dimire, ên din du an sê rojan bêhteng dimînin. Ev tiştê hanê karûbarên me zehmet dike." Em di hewşekê re derbas

bûn û li wê derê pir kal û pîr hebûn. Komêk biçûk li vir, komêk biçûk

li wir, ew kal û pîr li hev civiya bûn û wan bêhedan dikirin pitepit.

Dema em di ber wan re dibuhurin, wan nema dengê xwe kirin.

Lêbelê hema me pişta xwe dida wan, wê birrebirrê dîsa dest pê dikir,  
li ber guhên min dibû wekte qajiqajek zîzbûyî ya refek tûtûyên mê. Li ber devê deriyê avahiyekê, berpîrsiyar dev ji min qerîya: "Axayê Meursault, ez te tenê li vê derê dihêlim. Ez li ,nivîsgeha xwe  
ji bo hemû daxwaziyên te amede me. Di saet dehan de me biryara binaxkirinê daniye. Me ji xwe re got ku wilo jî tê bikaribî şevê gişî li ber serê rehmetiyê şevînî bibî. Ha! Ta ez xwe ji bîr nekim: xuya . ye diya te gelek caran ji hevalên xwe re diyar kiriye ku wê dixwest li  
gora dîn û ola me bê veşartin. Min rabûna bi vî karl avêt ser milên Li  
xwe, lê dixwest vê agahiyê bigihînime te ta hayê te jê hebe." Min jê  
re got mala wî ava. Lêbelê dayê di saxiya xwe de bê ku inkara hebûna  
Xwedê bikira ru carî bîra ol û mezheban nebiribû.  
Ez derbas bûm. Ew odeke pir rohnî bû, bi kilsê spîkiî bû û bi camekê  
rapêçandî bû. Ew bi sendeliyan û bi hespikine textînî di şiklê tîpa X de hatibû raxistin. Du ji wan hespikan di navenda odê de bûn û tabûtek devnuxumandî li ser wan bû. Depên tabûtê bi boyaxa  
qalikê gwîzan hatibû rengkirin û tiştê ji wan depan dihat xuyakirin tenê ew mîxên pêç ên pir hindik çûbûn xwarê dihatin xuya kirin, dibiriqandin û awirên mirov dikişandin. Nexweşnêrek ereb li

ber tabûtê bû, berdilkek spî lê bû û destmalek bi renekî xurt li dora

serê wê girêdayî bû.

Dergevan di wê gavê de di paş min re buhurî hundirê odê. wî bêguman bazdabû. Devê wî hinekî ket hev û got: "Devê tabûtê hatiyê

girtin, lê gerek ez wê ji bo te vekim ta ku ru bikaribî wê bibînî."

Ew nêzîkî tabûtê dibû dema min bi wî girt. wî ji min pirsî:

"Ma ru naxwazî?" Min vegerand û got: "Na". Ew di ciyê xwe de ma û ez aciz bûm ji ber ku min dizanîbû ku gerek min ew yek negota.

Piştî bêhnikê, wî li min nêrî û ji min pirsî: "çima?" lê wî gazin bi wê pirsê ji min nedikir û tenê dixwest bizanîbûya çima min nedixwest". Min got: "Ez nizanim." Wilo jî, wî simbêlên xwe ên spî li hev badan û bêyî ku li min binerîya got: "Ez têdigihêjim." Min bala xwe dayê ku çavên wî xweşik bûn, rengê wan şînekî vekirî

bû û pûsta rûyê wî hinekî sorik bû. wî sendeliyek ber bi min ve dirêj

kir û ew bi xwe hinekî ji min bi paş ve rûnişt. Ya nexweşnêr rabû ser xwe û berê xwe da den. Wê xwest derketa û di wê gavê de dergevan

ji min re got: " Ew kurmanxwan ye." Ez tênegihîştim wî çî dixwest bigota û wilo jî min li hemşîreyê nên. Min dît ku wê paçek li dora serê xwe di bin çavên xwe re girêdabû. Paç li rasta bêvilê pehn bû. Di wî rûyê hanê de tenê paçik spî dikir.

Dema ew derket, dergevan axifi: "Ez ê te bi tenê bihêlim." Ez nizanim



min çî kir lê ew li paş min şipya ma û hebûyîna wî wilo li pişt  
1:1.

min bi min ne xweş bû. Ronahiya xweşik ya dawiya rojê derbasî  
hundir dibû û li her derên odê belav dibû. Du mozqirtan, du  
mozên

sor li hember camê dikirin vinevin û hayê min jê hebû ku xewê  
zora min dibir û dida ser çavên min. Min ji yê dergevan pirsî bêyî  
ku min xwe bi aliyê wî de bizîviranda: "Ma ni ji zûde li vê derê  
yî?" wî bersiva min di cî de da û got: "pênc sal"- weke ku wî hemû  
temenê xwe derbas kirbû tenê li hêviya min û vê pirsê mabû.

Paşê wî di serê min de kir pitepit, got, çî ye ne çî ye ku eger berê  
rojê jê re bihata gotin ku dawî emir ew ê bibûya dergevanê  
wargeha

Morengoyê, ew ê behetî bimaya. Ew şêst û çar salî bû û ji Paôsê  
bû. Di wê navê de, min gotina wî birrî: " Ha, naxwe ni ne ji vê  
derê yî?" lê piştî pirsê hat bîra min ku ben ku wî ez bibirama bal  
berpirsiyar, ew ji min re li ser diya min axifibû. wî ji min re gotibû  
ku ji ber germa li ser vê erda rast û nemaze li vê navçeya hanê,  
gerek

ew deqe ben deqê bihata veşartin. wî hingê ji min re gotibû ku  
ew li Paôsê jiyabû û ku wî dikir nedikir ew ji bîra wî nediçû. Li  
Pansê,

mirov dikarin sê rojan û carinan jî çar rojan li ber laşê yê mirî  
bimînin.

Li vê derê, wextê mirovan ji bo tiştê wilo nine û hema têdigihêjin  
ku laşek li ser erdê dirêj kin ye, ew gerek li dû navgîna darbendan  
ber bi goristanê bazdin. Jina wî jê re gotibû: "Huş be, mirov  
tiştên wilo ji Mêrik re nabêje." Dema mirovê kal ji min re behsa

vê yekê kiribû wî şerm kiribû, rûyê wî sor bûbû û buhunn û bexşîn ji Inin xwestibû. Min wê gavê dengê xwe kiribû û jê re gotibû: "Na, ez tika dikim, tiştê rast rast e û ne gerek e ni bexşînê ji min bixwazî". Min didît ku tiştên wî digotin di ciyê xwe de û balkêş bûn.

Di oda biçûk ya cendekan de wî ji min re rave û rohnak kir ku ji ber naçaiî û desrengiyê, ew ketibû wê wargeha pîran. Lêbelê ji ber ku wî xwe li ser xwe didît, wî xwe pêşkêş kiribû û xwestibû ciyê dergevanê

wargehê bigirta. Min ji wî re got ku çawa bûya ew jî yekî wek wan pîrên hanê bû. Wî ji min re got naxêr ne rast e. Wî berê bala min kişandibû çawa behsa nişênên mala pîran dikir; wî ew bi nav nedikirin û tenê digot: "wan", "yên din", û pir kêman caran digot"

yên pîr", tevî ku hin ji nav wan bi salên xwe ji wî ne mezintir bûn. Lêbelê tişt helbet ji hev cihê bûn: ew dergevan bû û bi hawakî

mare wî hebû xwe di ser serê wan re bidîta û emir li wan bikira. Nexweşnêra goyinger di wê gavê de buhurî hW1dir. Êvar ji nişkê ve ketibû û şevreşê xwe li ser wan carnan perixandibû. Dergevan destikê ekestrîkê bada û ronahî bi wê yekê pijiqî û çavên min kwîr kir. Wî destê xwe ji bo şivê ji min re ber bi sifrexanê ve kir lê ez ne birçî bûm. Ji ber ku dilê min nediçû xwarinê wî xwest ji min re qehwak bi şîr bianiya. Ez bi xwe gelekî ji qehwa bi şîr hez dikim û min pêşniyariya wî pejirand û got erê. Ew pişî demekê bi berkêşokekê

vegeriya. Min qehweşîra xwe vexwar û bi vexwarina wê re dilê min bijiya kişandina eixarekê. Ez dudilîbûm, dilekî min got çima na

û dilekî min got na nabe, nabe ez li ber dayê vî tişê bikim. Ez  
rarniyam  
û min ev tişt yekcar bêmane dît. Min cixarek dirêjê dergevan jî  
kir û me herduyan eixarên xwe kişandin.  
wî paşê ji min re got: "Hevalên Xanima diya te wê bên ew jî li  
ber serê wê şevê bimînin. Ev tişt li vê derê adet e. Gerek ez rabim  
herim sendeliyan bînim û qehwa reş amede bikim. şewqa xurt li  
ser  
dîwarên spî ez diwestandim û min ji wî pirsî ka wî dikarîbû yek ji  
wan lempan verniranda. wî li min vegerand ku ew yek yekcar ne  
mumkin bû. Lempe wilo hatibûn kişandin, an giş bi hev re  
pêdiketin,  
an jî giş bi hev re vemirî diman. Min nema pir guh li dergevan  
kir. Ew çû û dema vegeriya wî dest pê kir sendelî rêz kirin. Li ser  
sendeliyekê ji nav wan sendeliyan, wî fineanên qehwê li kêleka  
eizwa  
ser eletîkê danîn ser hev. Piştî ew li hember min li aliyê din yê  
dayê rûnişt. Nexweşnêra goyinger jî di zikê odê de rûniştibû û  
piştî  
xwe dabû me. Min nedidît wê çî dikir lêbelê ji livandina bend û  
pazûyên  
destên wê, min dikarîbû bigota ku wê bi sîxên tentenan tiştêk  
dihûna. DW1ya hênik û xweş bû, qehwê canê min germ kir û di  
deriyê vekitî re bêhna şevê û bêhna gulên dihatin. Ez bawer im ez  
hinekî xulmaş bûm.  
Ez li ser dengêkî sivik wek dengê kirasekî ku bilive hişiyar bûm.  
Min çavên xwe girtibûn û wilo jî gava min ew vekirin, ew ode ji  
min re spîtir hat xuyakirin. Li ber min, siyek çî ye ji bo dermanan jî

peyda nedibû. Her ~t, her kûşe, her derên kec wiqas bi diqet  
xuyakirin

ku wan awirên mirovan dibirrîn. Di eynî wê gavê de hevalên  
dayê derbas bûn. Ew bi giştî deh kesek hebûn û di nava ronahiya  
awirberr de bédeng buhurîn. Ew rûniştin bê ku wan qirçîniyeke çî  
ye ji sendeliyekê bianîna. Min ew didîtin wek ku ew cara pêşîn bû  
di temenê min de min bi çavên serê xwe kes didîtin. Tiştêkî biçûk  
çî

ye ne ji rû ne ji kirasên wan ji min nefilitî lê dengên wan yekcarî  
nedigaştin

guhên min û min nizanîbû çawa min ê ji çavên xwe bawer  
bikira ku ew kes bi rastî hebûn, li wê derê li hember min rûniştî  
bûn. Piraniya pir ya jinên pîr bi pêşmalik bûn û benê ku wan  
pîrejinan

li nava xwe gerandibûn bêtir zikên wan yê tilêrî dida xuyakirin.  
Berê, wê ziktilêriyê tu carî bala min nekişandibû û min nizanîbû ku  
zikê jinên pîr wiqasî mezin dibû. Kalên li wê derê piraniya wan î pir  
hizhizî bûn û bi gopalan dimeşyan. Tiştê ku di rûyên wan de pir  
bala min kişand ew bû ku min ji binî ve çavên wan nedidît û di  
nava

hêlînek qermîçok de, min tenê rohniyek pîsik didît. Dema ew  
rûniştin, piraniya wan li min nêrîn û bi acizbûnekê serên xwe  
hejandin.

Lêvên wan di korta devên bêdiran de çûbûn xwarê û ez  
tênegihîştim

çima wan wilo serê xwe ji min re hejandin, gelo wan silav li  
min dikirin an jî serên wan ji ber xwe, ji ber pîrbûyînekê bêyî dilên  
wan dihejyan. Ez bêtir bawer dikim ku wan silav li min dikirin. Di

wê gavê de min bala xwe dayê ku ew hemû li hember min li hawîrdora

dergevên rûniştibûn û serê xwe hêdîka dihejandin. Di kêlîkekê de, ~tekî seyr, tiştêkî nediket aqilan ket serê min: ew pîr û kal di dadigehekê de li min civiya bûn ta hukmek di derheqa min de bibirîna.

Hinekî derengtir, ji nav wan pîrejinan yekê dest bi girî kir. Ew di rêza duduyan de bû û ji ber hevakele wê min xweş ew nedidît. Wê di ber xwe de bêwestan bi dengêkî nizim dikir hîskehîsk. Min bawer

kir ku wê tu carî nema dev ji wî giriyê xwe berda. Pîr û kalên din li wir bûn wek ku wan dengê wê nedibilûstin. Ew jihevketi, rûtirş,

bêdeng bûn. Wan li tabûtê, li gopalên xwe, li çî bûya dinêrîn.

P"irejin di ber xwe de digirya û ez gelek"imat bûm ji ber ku min ew

nas nedikir. Min dixwest bes dengê wê bibih"ista lêbelê min ceger nedikir ew tişt jê re bigota. Dergevan xwe bi aliyê wê xwar kir, bi wê re peyiv"i, lê wê serê xwe bi neyî hejand, tiştêkî di ber xwe de got

û giriyê xwe bi wê berdewamiyê dirêj kir. Dergevan xwe nêzîkî min kir û li kêleka min rûn~t. P~ê demeke baş dirêj, wî bê ku li min bineriyâ

ew yek ji min re rave kir: "Di navbera wê û Xanima diya te de pêwendiyêke pir xurt hebû. Ew dibêje ku ji bill diya te tu hevalên

wê li vê derê tunebûn û anuha ji tu kesî wê nemaye.»

Em demeke dirêj wilo man. Axîn û giriyê wê plrejinê hin bi hin

kêm bûn. Wê bi difua xwe pir fikir finefin û dawîya dawî ew temin.

Xewa min nema dihat lê ez westiya bûm û êş ketibû p~ta min. Anuha bêdengiya wan mirovan bi min pir naxwoş bû û bêhna min teng fikir. Car carna, tenê dengekî' taybeti dihat guhê min û pêşl min nizanibû ew yê çî bû .. Dawî min tê derxist ku hinekan ji nav wan plrû kalan goştê gepên xwe dimijandin û bi wê mijandinê wan ew mirçemirça naxwoş û seyr derdixistin. Wan wîqasî xwe di nav hizr û ramanên xwe de wînda kiribûn ku hayê wan ji wan û ji wê mirçemirçê tunebûn. Di wê navberê de gumanek di serê min de bi ge~de bû û min bawer kir ku ew miriya li wê derê ramidandî di çavên wan kesan de tişteki bêrûmet bû. Lê anuha ez bawer im ku ez şaş bûm.

Dergevan qehwe li me gerand û me gişa qehwa xwe vexwar. Paşê ez nema dizanim çawa şev derbas bû. Tê bîra min ku di demekê de min çavên xwe vekirin û min dît ku hemû kal û plr di xew re çûbûn û bi ser hev de ketibûn. Tenê yekî ji wan kalan çena xwe dam ser destên xwe ên bi darê gopal girtibûn û wî hema zîq li min dinên, wek ku ew tenê li hêviya min bû ku ez ji xewê rabûma. Paşê ez dîsa

razam. Êşa p~ta min xurtir dibû û ez ji ber wê ji xew rabûm. Rona-16

hiya rojê derbas bûbû û di ser carnan re dişemitî. Hinekî paşê, kalek

hişyar bû û gelekî kuxiya. wî di desmalek damikî de tif fikir û her ku ew dikuxuya te digot perçak ji kezeba wî bi wê kuXukê re derdiket.

wî pîr û kalên din ji xew rakirin û dergevan ji wan re got gerek  
bû ew rabûna ser xwe û derketana. şevê bi wê zehmetiyê rûyê  
wan  
gişan bi rengê xweliyê seyinandibû. Dema ew derketin, wan gişan  
destên xwe dane min. Vê yekê hişt ez gelekî ecêbmayî bibûma. Di  
wê şevê giştî de me gotinek çî ye ji hev re negotibû lê wê şevê te di.  
got belkî bêtir me nêzîkî hev kiribû û pêwendiyên di navbera me  
de  
xurtir kiribûn .  
Ez westiyabûm û yê dergevan min bir bal xwe û li wê derê min  
hinekî serçavê xwe şûşt û çek-mekên xwe rast kirin. Min dîsa  
qehwa  
bi şîr vexwar û ew gelekî xweş bû. Dema ez derketim roj bi giştî  
derketibû û ber bi zikê asmanan ve bilind dibû. Di ser girên di  
navbera  
Marengo û deryayê de, sorayiyê xwe li asmanan pêçandibû û  
bayê ku di ser wan giran re dihat bêhna xwê bi xwe re dianî.  
Bêguman  
rojeke xweş dest pê dikir û min ji mêj ve li dervî bajêr, di nava  
gund û erdan de xwe nedîtibû. Min dizanîbû kêfa min ê çiqasî  
mezin  
bûya eger ez ji xwe re bi kêfa serê xwe li wan deran bigeriyama,  
eger ne ji ber dayê bûya.  
Ez ji xwe re ne geriyam û di hewşê de, di bin darek çînarê de,  
bendewar mam. Min sînga xwe tije bêhna axa hênîk dikir û xewa  
min nema dihat. Kesên bi min re kar dikirin wê gavê hatin bîra  
min. Ew di wê saetê de ji xew radibûn diçûn kar û ji bo min di rojê

gişî de ew saet ya heri zehmet bû. Ez hinekî din bi van tiştan daketim,  
lê zingilekî di nav xaniyan de lêdixist û dengê wîzingilî bala min ji cî bir. Li paş penceran xirecîrekê dest pê kir lê piştî demeke kurt dîsa her tişt bêdeng bû. Roka rojê hinekî din ber bi zikê asmanan hilkişiyabû û dest pê kir bi tîna xwe nigên min germ dikir.  
Dergevan  
di hewşê re buhuri û ji min re got ku serdebîr li min digeriya. Ez çûm nivîsgeha wî û li wê derê wî çend kaxezên resmî bi min da imzekirin. Min bala xwe dayê ku wî bi ser şerwalekî xetxetî çekên reş li xwe kiribûn. Wî rahişt destikê telefonê û bi hişkayî ji min re got: "Ev heye demeke ku karkerên kefenkirin û veşartinê amede ne.  
Ez ê ji wan bixwazim ku bîna devê tabûtê bigirin. Tu dixwazî ji bo cara dawîn berî girtina tabûtê li diya xwe binêrî?" Min got na. Wî di telefonê de dengê xwe nizim kir û bi fermanî got: " Figeaç, ji zilaman re bêje ku ew dikarin dest pê bikin".  
Paşê wî ji min re got ku ew ê hazirî veşartinê bibûya û min jê re got mala wî ava. Ew li paş nivîsgeha xwe rûnişt û wî çimên xwe yên kinik avêtin ser hev. Wî got ku ji bo binaxkirinê ez û wî em ê bi tenê bûna, tev li nexweşnêra newbedar. Ew bi xwe nedibû ku rûniştevanên mala pîran hazir bibûna. Wî tenê destûr dida û dihişt ku



şeva dawî ew li ber laşê yê mirî şevînî bibûna. wî ev yek ji min re rave

kir û got: "Ev pirs pirseke mirovan tiyê ye". Lêbelê, vê carê, tenê vê carê, wî hiştibû ku hevalemî kevn yê dayê bi navê xwe Thomasê Perez tev li kesên li dû cenazê bibûya. Serdebîr li vê derê hinekî di ber xwe de keniya û berdomand:" Ev hîsa hanê wek tu dibînî bi xwe hinek zaroktî tê de heye. Lê Perez û diya te, bêje hema tu carî ji hev qut nedibûn. Ûvê derê her kesî ji xwe re bi henekî ji Perez re digot: "Ev dergîstiya te ye" û Perez bi vê yekê hema dikeniya. vî tiştî dilê wan xweş dikir û birastî jî mirina Xanima Meursault gelekî lê kêr kiriye. wî xwest bi me re bê û min giring nedît ku min daxwaziya

wî bavêta. Lê li gor şîreta textorê ku tê dîtina xanînişînên me min nehişt ku do ew jî beşdarî şevîniya li ~er laş .bibûya".

Wexteke baş dirêj di wê navberê de buhurî bêyî ku deng ji yekî ji me herduyan derketa. Serdebîr paşê rabû ser xwe û di pencereya nivîsgeha

xwe re nêrî û got: "Va ye keşê Marengoyê. Ew berî wextê hatiye." wî xwest ku hayê min jê hebûya ku bi kêmanî sê çarîk meş li pêşiya me hebûn ta me xwe peya bigihanda dêra di gund de. Em daketin. Keşe bi du zarokên sirûdxwendeyên dêrê li ber avahiyê bû.

Bixurdan di destê yekî ji wan zarokan de bû û keşe xwe daqûl kiribû

dirêjbûna zincîra zîvînî dûzan dikir. Dema em gihaştin ber wan, keşe rabû ser xwe. wî got" Lawê min " û çend gotin ji min re ki-

18

rin. Piştî ew buhurî hundir û min da dû.

Min seraser dît ku mîxpêçên tabûtê di depên wê de çûbûn xwarê û çar mirovên bi çekên reş di hundirê odê de bûn. Di eynî vê gavê de dengê serdebîrgihaştguhê min û wî ji min re got ku ereba darbendkêşê

li ser rê li bendî me bû û wilo jî keşe dest bi xwendina xwe kir. Ji vê gavê û vir de, tiştan bi lez dan dû hev û derbas bûn. Her çar mirovan rahiştin çerşefekê û ber bi tabûtê çûn. Keşe, herdu berdestên wî, serdebîr û ez jî em derketin. Jinek li ber devê derî bû.

Min ew nas nedikir. Serde bîr ez bi wê dam nas kirin û got: "Eve axayê Meursault". wî navê wê jî ji min re got lê ew nav negihaştguhên min, tenê min nas kir ku ew jina hanê nexweşnêra nemayende, hemşîreya çavdêr bû. Bê rûkenî wê bi serê xwe silav li min kir û rûyê xwe yê dirêjokî 'û giş hestî ber bi jêr ve xwar kir. Paşê me gişa xwe da alî û me ji bo derbasbûna laş rê vekir. Me da dû wan çar kesên

tabût hilgirtibûn û em ji seraya pîran derketin. Ereba tabûtê li ber devê derî rawestiya bû. Ew lekkiri, dirêjokî û şewqdar bû û wê bi şikilê xwe qelemdanik anî bîra min. Berpirsiyarê kefenkirin û veşartinê

li kêleka wê bû ..Ew qamqutikî bû û kenê mirovan bi çekên wî dihat. Mirovekî kal jî bi tevgerine ne xwezayî li kêlekê bû û min nas kir ku ew Perez bû. wî kumekî ji kulavê nerm, kumekî girover bi hawîdorên pehn xistibû serê xwe (Wî ew ji serê xwe kir dema tabût

ji derî derket). wî taximek li xwe kiribû û şerwalê wî yê pir dirêj

li.ser solên wî xwe li hev badida û glofitik çê dikirin. Girêka qirika wî ji cawekî reş bû û ew girêk gelekî biçûk bû li gor gerdena mezin ya gumlikê spî. Lêvên wî di bin pozek tije pitikên reş de dilerziyan. Du guhên bi ecêb di nav porê wî yê spî û nermokî de dadilqiyân û kerînokên wan ne lihevhatî bûn. Guhên wî wek xwînê sor bûn û wan guhan di wî rûyê zuha de gelekî bala min kişandin.

Berpirsiyarê

kefenkirin û binaxkirinê ciyê her yekî nîşanî me da: Keşe li pêşiyê û li dû wî ereba tabûtkêş. Li kêleka erebê, ew çar barhilgirên hanê.

Li paş erebê, ez û serdebîr û li dawiya me gişan, nexweşnêra çavdêr

û axayê Perez.

Rok baş hilkişiyabû Ê asmanê sincirî anuha hemû giranî û wexma xwe bi ser rûyê erdê berdida. Germa rojê hema xun dibû û ez nizanim

çima em wiqasî man berî me bida ser rê. Min di nav wan çekên reşî tarî de pir germ bû. Kalê hûrik yê serê xwe nuxumandibû dîsa kumê xwe ji serê xwe kir. Ez hinekî bi aliyê wî mirovî de zîvirîbûm û min lê mêze fikir, gava serdebîr ji min re behsa wî kir. wî got ku gelek caran ew û diya min êvaran bi hev re derdiketin û bêyî ku nexweşnêrek ji wan qut biba an dûr biketa ew ta wî gundî ji xwe re

dimeşyan. Min li der û dorên gund temaşe kir. Ez anuha di diya xwe de digihêjim, dizanim çima êvaran wê ji vê deverê hez dikir.

Di

nav van darên serûyê ên rêzên xwe rast dikirin û dûr diçûn, digihaştin

wan tepên ber perên asmanan diçûn, li ser vê axa narincî û kesk,

di nav van xanîyên hindik ên bi zanebûn wilo xweşik hatibûn  
sazkirin,  
erê çima na, ez dizanim çima dayê ji vê derê hez dikir. Piştî agirê  
rojê, êvar li vê navçeyê diket û bêguman ew wek navberek ji  
aşîtiyeke  
xemgîn bû, ew wek îstegehek ji xweşiyê bû. Îro, di qiçîna nava  
rojê de, pêtên rencawerji jor dibariyan û dihiştin ku tiştan li ber  
çavên  
min leylan bidana. Pêtên şewatê hawîrdor dikirin dogeh eke ku  
debara tu kesî tê de nedibû.  
Em ji ciyê xwe liviyan û me da ser rê. Di wê gavê de, min têder-  
Xist ku Perez hinekî dikuliya. Erebe hin bi hin bi pele û zûtir diçû û  
wê dihişt ku rora Perezê pîr jî biçûya û ew li paş me bima. Yek ji  
wan çar barhilgêrên ku dabûn tengala erbanê jî li paş ket û anuha  
ew di rêzci min de dimeşiya. Rok gelekî bi lez ber bi zikê asmanan  
hildikişiya û wê zûbûnê hişt ez ecêb mayî bûbûma. Min bala xwe  
dayê ku êdî ji mêj ve hawîrdora me tije vinevin û zimezima  
zindewar  
û kêzikan û dengê xişexişa gîha bû. Xwêdan di ser rûçikên min  
re dihate xwarê. Ez serqot bûm û min destmalka xwe ji xwe re kir  
wek baweşinkê û min ba li xwe dikir. Karkerê kefenkirin û  
veşartina  
miriyan yê ku li paş hevalê xwe mabû û ketibû rêza min ji min re  
di.  
wê kêlîkê de tişteke got, lê dengê wî xweş negihaşt guhên min. Di  
eynî wextê de, wî bi destê çepê qehfê serê xwe bi destmalekê  
zuha  
dikir û destê wî yê rastê bi pêşiya kum digin ew bilind dikir. Min jê

pirsî: "Te çi got?" wî gotina xwe du gîsin kir û li asmanan nêrî:  
"Agir dibare". Min got: "erê". Piştî demeke kin wî pirsî: "Ev ya di  
vir de diya te ye?" Min car din got: "Erê". "Ew pîr bû?". Min  
vegerand:

"Hinekî". Min wilo vegerand ji ber ku min temenê diya xwe  
yê rastî nizanîbû. Paşê, wî nema dengê xwe kir. Ez li paş xwe  
zîvirîm

û min li Perezê kal nêrî û dît ku ew nêzîkî pêncî şêst gavî li paş  
me mabû. wî dilezand û kumê xwe di destê xwe de bi vî alî û bi wî  
alî fikir. Min li serdebîr jî nêrî. Ew bi gelek meznayî û giranî  
dimeşiya

û livandineke çiyê ne di ciyê xwe de jê çênedibû. Çend dilopên  
xwêdanê li ser eniya wî dibiriqîn lê wî ew zuha nedikirin.

Ji min re xuya dibû ku koçê dest pê kiribû hinekî bêtir bi lez  
dimeşiya.

Di nav wan gundan de, li wê hawîrdorê, Ôlla rokê xwe berdabû  
her derê, ji her qulê dipijiqî û ji ber şewqa gelekîxun debara  
mirovan nedibû. Li ser wê rêya ku ber bi gund ve diçû perçak ji nû  
ve hatibû qîr kirin. Solên nigên me di qîrê de diçûn xwarê û şûna  
xwe di laşê şewqdar de çêdikirin. Kumê erbaneçî yê ji çermê ku di  
nav avê de hatibû. kelandin li jora erebê xuya fikir û te digot ew  
kum ne di nav avê de lê di nav wê heriya reş ya rê de hatibû  
kelandin.

Min xwe ji bîr kiribû ji aliyekî di nava wî asmanê şîn û spî de û  
ji aliyê din di nav hevtayiya rengê reş de: reşê qîra mezeloqî ya ku  
bi  
niganradibû; reşê tarî û vemirî yê kincan û reşê şewqdar yê erebê.

Ji ber rokê, bêhna çerm û rêxa dewarên ku erebe dikişandin,  
bêhna  
cîla û bixûrê, dijawariya şevê bê xew dunya li ber çavên min  
dilerziya  
fekar di serê min de tevlihev dibûn. Min dîsa li paş xwe nêrî û Perez  
ji min ve pir dûr xuya kir, ew di nav ewrekî mezin î germê de  
winda bûbû û paşê min nema ew dît. Min çavên xwe lê gerandin û  
dît ku ew ji ser rê derketibû û dabû nav erdan. Rê jî li wê derê xwe  
li xwe dipêçand û ez têgihîştim ku Perezê ku xweş ew der nas dikir,  
dizanîbû çawa rêya xwe kurt bikira. Piştî wê deverê Perez dîsa tev  
li  
me bû. Paşê, me car din ew winda kir. Ew gelek caran bi wî awayî  
ji  
ser rê derket û wî da nav erdan û ez pê dihesiyam ku xwîna min  
ber  
11  
bi serên min hildikişiya û di cênîkên min de lêdida.  
Paşê, tiştan bi lezek mezin, bi zanebûn, bi duzan û bi xwezayî  
dan dû hev. Ji wan gişan tenê tiştek tê bîra min: li serê gund,  
nexwçşnêra  
çavdêr bi min re axifî. Dengê wê dengêkî taybetî, dilncşîn  
û lerzdar bû û wî dengî bi xwe ji binî ve bi wî rûyê zuha û giş hestî  
li hev nedikir. Wê ji min re got: "Mirov nizane çî bike çî neke. Eger  
em bi bêhna fireh herin heye ku tîna rokê li me bide û me  
bişewitîne.  
Eger em gelekî bilezînin, ji xwe em ê di nav xwêdanê de bifetisin  
û di hundirê dêrê de, taya sar û germ wê me bigire". Gotina wê

di ciyê xwe de bû û birastî tu çare li ber me tunebûn. Ji vê roja hanê,  
çend sûretine din jî di serê min de man, wek nimûne, ez dikarim bibêjim rûyê Pêrez wextê cara dawî li serê gund ew tev li me bû. Hêsirine mezin ji bêhtengiyê û ji şewata nava wî li ser rûçikên wî digeriyan. Ji ber pîrbûna qerrnîçokan ew hêsir nedihatî xwarê û

wan xwe radixistin, xwe tev li hev dikirin û lekek ji avê li ser rûyê jihevketî

çêdikirin. Sûretin din tîn bîra min: dêr û gundiyên li ser kêlekên cadê, gulên sor ên şemedanî li ser tîrbên goristanê, Pêrez gava ji ser hişê xwe çû (dema ew li ser axê gevizî te digot ew bûkeke sisto-fisto ji textikan bû), axa di rengê xwîna sor de ya ku di ser tabûta

dayê re digindirî û laşê spî yê kok û rehên dar û gihayên tev li wê axê dibûn, hin kesên din, deng, gund, ew wexta ku li ber devê çayxanê ez li bendî otobusê mam, guregura bêwestan ya motor û kêfxweşiya min dema otobûsê wek çûkekî xwe berda hêlîna ronahiyên

serbajarê Cezayirê. Ûtê bîra min jî min di serê xwe de ji xwe re got ku min ê di nav nivînan de xwe dirêj bikira û ez ê duwanzdeh saetan ser hev razama.

il

Gava ez ji xewê şiyar bûm, ez têgihîştim çima xwedanê karê min bêkêf xuya kir dema min du rojên bêkarî jê xwestin: ma ne îro bi xwe şemî ye. Min bîra vê yekê nebiribû, lê gava ez şiyar bûm, ev 6-2.2.

kira han hate serê min. Xwedanê karê min helbet wilo bawer kir ku . min ê tev yekşema xwe çar roj bistandana û vî tiştî nikarîbû kêfa wî bianiya. Lê ji aliyekî, sûc ne sûcê min bû eger diya min di şûna îro de do îne hat veşartin û ji aliyekî din, min ê her şemî û yekşema xwe bistanda. Lêbelê dîsa jî vî tiştî nehişt ku ez xwedanê karê xwe îem nekim. Ez ji ber roja buhurî gelekî westiyabûm û wilo jî ez bi zehmetî ji nav ciyan rabûm. Min riya xwe kur fikir û ji ber ku min nizanîbû min ê çi bikira min biryar da herim ji xwe re têkevîm avê. Ez li tramwayê siwar bûm, ber bi bingeha avjeniya benderê çûm û li devera ku derya teng dibû, min xwe di avê de kir. Gelek kes hebûn û di avê de min car din Marie Cardona dît. Wê berê li ser mekîna nî . vîsandinê li ciyê karê min kar fikir. Dilê min wê çaxê bijiya bû wê û di baweriya min de yê wê jî dixwest, lêbelê ew pir nema û piştî çûyîna wê me wext nedît. Wê dixwest hilkişiya ser lastîka pufdayî û min alî wê kir û bi wê yekê, min destê xwe li çîçikên wê xistin. Wê xwe bi ser dev li ser lastîka puf dayî dirêj kiribû û ez hêna di nav avê de bûm gava wê berê xwe ber bi min ve kir. Porê wê ketibû nav çavê wê û ew dikeniya. Min xwe çeng kir ser lastîka pufdayî û ez li kêleka wê rûniştim. Dunya xweş bû û, wek bi henekî, min serê xwe bi paş ve xwar kir û danî ser zikê wê. Wê dengê xwe nekir û ez jî wilo



mam. Asman bi hemû ferehiya xwe hatibû ber çavên min û ew  
asmanekî  
şin û zêrîn bû. Di bin paşustuyê min de hinava Marie hêdîka  
lêdida. Nîv di xew de û nîv heşyar, em demek dirêj li ser doşeka  
puf dayî man. Dema tava rokê pir xurt bû, Marie xwe berda nav  
avê û min da dû. Min ew zeft kir, destê xwe li navtenga wê gerand  
û me bi hev re wilo ajne kir. Marie hema dikeniya. Li qiraxa avê  
me  
xwe zuha dikir dema wê ji min re got: "Biner, ez ji te reştir im".  
Min jê xwest ku êvarê em bi hev re herin sînemê. Wê dixwest  
biçûya  
îilmekî ku Femadêl tê <ie dilîst. Dema me cilên xwe li xwe kirin,  
ew gelekî behetî ma dema çav li gerafêta reş ket û wê ji min pirsî  
ka  
min şînî dikişand. Min jê re got ku diya min miribû. Wê xwest  
bizanîbûya  
ew ji kengî ve miribû û min lê vegerand "ji do ve", ew hinekî  
vekişiya, lê dîsa tişteke neda ber rûyê min. Ez hatim jê re bibêjim  
ku ne sûcê min bû, lê ez fikirîm min ev tişt berê ji xwedanê karê  
xwe re gotibû û min dengê xwe nekir. Lê eger suc sucê min bûya  
an na ev yek tişteke bêmane bû, ji ber ku çawa be, mirov herdem  
hinekî suçdar e.  
Êvarê, Marie hertişt ji bîr kiribû. Kenê mirov car carna bi film ctihat  
lê ew bi rastî filmekî ji bo zarokan bû. Min ranê xwe bi ranê wê  
kiribû û bi çîçikên wê ctilîst. Hinctik ji filim re mabû tev bibûya  
gava  
min ew maç kir, lêbelê ne bi awakî xweşik. Piştî ku em derketin,  
ew

hat bal min malê.

Dema ez ji xew rabûm Marie çû bû. Wê berê ji min re rave kiribû ku gerek biçûya mala met an xaltîka xwe. Min ji xwe re got roj yekşem bû û ez aciz bûm ji ber ku ez ji yekşeman hez nakim. Wilo jî min xwe cti nav ciyên xwe de qulipand û ez li bêhna xwê geriyam,

ew bêhna ku porê Marie di balîfa dirêj de hiştibû û ta saet deh ez razam. Paşê ez ji xew rabûm û ta nîvê rojê ez wilo di nav ciyan de mam û min cixare kişandin. Min nedixwest biçûma bal Cêleste û wek her carê fravîna xwe li wê derê bixwara. Min dizanîbû ku bêguman

pirs ê ji min bihatana kirin û ez ji vî tiştî hez nakim. Min çend hêk ji xwe re çêkirin û min bê nan di miqilkê de xwar. Nanê min nema bû û ji min nedihat daketama.

Piştî fravînê ez bi dilekî teng cti apartimanê de çûm û hatim. Dema dayê li bal min bû ew apartiman baş bû lê anuha ew ji bo min pir mezin e. Ji ber vê yekê jî min masa xwarinê ji oda nanxwarinê guhest oda razanê. Di vê odê de, di nava sendeliyên ku pûşê wan hinekî çûye xwarê, dolaba bi neynika zerbûyî, masa serçav şûştinê û

textê ji misê, ez tenê ctijîm û hemû tiştên din berdayî û bêxwedî mane. Hinekî derengtir, ta min tişteke bikira, ez rabûm û min rahişt rojnameyek kevn û min ew xwend. Min rêklamek ji bo xwêyên Knischen jêkir û min ew li defterek kevn xist. Gava cti rojnamekê de

kêfa min ji tişteke re bihata, min ew jê ctikir û. li wê defterê dixist. Min destê xwe jî şûştin û piştî ez çûm ketim balkonê.

Li vî dorbarjî, oda min li cadeya serekîn ya tarê dinere. Piştî nîvroj

dunya xweş bû lê kevirên cadê bi dohn bûn, mirov li ser wan pir kêm bûn û bi ser de jî bi lez dixuyan. Pêşî malbatên ji xwe re tev - zarokan derdiketin seyranê li ser cadê xuyabûn. Du lawikên biçûk bi bedlên deryayî, bi şelwarên kurt ên digihaştin jêra çokên wan û ew di nav wan çekên hişk de te digot hatibûn girêdan. Keçeke biçûk

bi girêkek pemba û bi soline reşî ôlakirî bi wan herdu lawikan re bû. Dê û bavê wan dabûn dû wan. Dê gelekî qelew bû û kirasekî hebirmêşî qehweyî li xwe kiribû. Bavo zilamekî kinikî hûrik bû û tenê

ez wî bi şikil nas dikim. wî kumekî ji qeselan dabû serê xwe, girêkek

minminîkî li dora hustuyê xwe girêdabû, gopalek bi destê xwe wergirtibû. Dema min ew bi jina wî re dit, min nas kir çima di taxê de digotin ku ew mirovekî bijarete û rûmetbilind bû. Piştî wan malbatan bi demeke ne pir dirêj xortên tarê derketin. Wan rûnê ku

dihêle por bibiriqîne di porê xwe dabûn, girafetên sor xistibûn qirika

xwe, çakêtên navpişt teng li xwe kiribûn, di bêrîka ber dil ya çakêtan

de destmalên neqîşandî çikandibûn û wan solên pozqut xistibûn lingên xwe. Min di serê xwe de got ku hebû nebû wan bêguman berê xwe dabûn sînema navenda bajêr ji ber ku ew zû ji mal derdiketin û bi kenekî pir bilind ber bi tramwayê dilezandin. Piştî wan kesan, cade hin bi hin vikîvala bû. Temaşegehan di baweriya

min de li her derê dest pê kiribûn. Tenê xwediyên dikanan û

pisîk di cadê de mabûn. Di ser darên hencîran ên li kêleka cadê,  
asman  
sayî bû lêbelê ew asmanekî vemirî û bê ronahî bû. Li kêleka  
cadê li aliyê din, xwediyê dikana tûtinfiroşiyê sendeliyek ber bi  
devê  
dikanê ve kişandibû, kerikî li ser rûniştibû û herdu arişkên xwe  
danîbûn  
ser pişta wê. Tramwayên ku ta berî bêhnikekê rê û rêwanî di  
wande tunebû anuha bêje vikîvala diçûn û dihatin. Li kêleka  
dikana  
tûtinfiroş garsonê qehwexana biçûk ya bi navê "li bal Pierrot"  
kapeka text di eywana vala de rêş dikir. Roj bi rastî yekşem bû.  
Min sendeliya xwe zîvirand û ez wek xwediyê dikana tûtinfiroş  
rûniştim ji ber ku min dît ku ew hawê rûniştinê xwêtir bû. Piştî  
kişandina  
du çixaran ez derbasî hundir bûm, min rahişt perçeyek çoklatê  
û ez ber bi pencerê çûm ta wê çolkatê liwê derê bixwim. Hinekî  
derengtir, asman tarî bû û min bawer kir ku tavek ji tavên havînê  
ê bi ser me de biketa. Lê tevlî ku paşê rûyê asmên dîsa hin bi hin  
sayî  
bû, min bala xwe dayê ku derbasbûna ewrên mezin di ser rûyê  
cadê re mîna soza baranê li dû xwe hiştibû û wê sozê dihişt ku  
cade  
tarîtir bibûya. Ez wilo mam û min ji xwe re demeke dirêj li asmên  
nêrî.  
Saet lipêncan, tramwayine di nav dengên bilind de gihaştin. Wan  
ji yarîgeha dora bajêr rahiştibûn qeflên temaşevanan û ew bi xwe  
re

vedigerandin tacê. Temaşevan li ser pelikên ber devê deriyan xwe bi

deriyan ve daliqandibûn û xwe bi ser lûlên dora tramwayan xwar kiribûn.

Paşê bazîger jî vegeriyan û min ew ji wan çentên wan ên biçûk nas kirin. Wan qirika xwe bi qîrînê diçirandin, distiran û digotin ku kluba wan ê tu carî nemiraya. Çendina ji wan bazîgeran destê xwe ji min re bilind kirin û yekî berê xweber bi min ve kir û bi qîrîn got: "Me rora wan bir". Min serê xwe ber bi jêr ve hejand û

got: "erê". Piştî trumbêlan dest pê kirin û ber bi cadê hatin.

Roj hinekî din geriya û hat guhertin. Rengekî bi ser sore di ser banên avahiyan re xwe li asmên girt û bi ketina êvarê re, jiyan bi cadeyên

vala ve hat. Kesên ji xwe re derketibûn seyranê hin bi hin vedigeriyan.

Di nav wan de min ew mirovê ku dema gotin dihat ser jê re digotin mirovê bijarte û rûmetbilind dîsa dît. Zarok digiriyan an jî wan nedixwestin bimîyana û wilo jî dê û bavên wan ew bi dû xwe ve dikişkişandin. Deriyên sînemeyên tarê di wê gavê de vebûn'

û pêlên temaşevanan li ser cadan belav bûn. Di nav wan de, xortên

tacê ji her carê bêtir ji xwe bi bawerî dixuyan û ji dan û ji tevgera wan, min nas kir ku ew çûbûn f'ilmekî serpêhatiyan. Yên ji sînemeyên

bajêr vedigeriyan hinekî derengtir gihaştin û ew ji yê ji sînemên berdora bajêr girantir dixuyan. Tevlî ew hîna ji xwe re dikeniyên lê car caran ew ji min re diyar bûn wek ku ew ji tiştê westiyayî

:i6

bûn û hişê wan li derine dûr mabû. Ew li ser kêleka cadeya

hember

min çûn û hatin. Keçên tarê porên xwe berdabûn, destên Xwe

xistibûn

bin milên hev û ji xwe re digeriyan. Xortan ji qazî ve di ber

wan re diçûn û bi wan re henek dikirin. Keç li paş xwe dizîvirin û

dikeniyên. Çendina ji nav wan ku min ew nas dikirin destê xwe ji

min re bilind kirin.

Lempên cadê ji nişkê ve pêketin û wan ronahiya stêrikên pêşîn ên

ku ber bi tariya şevê hişkişiyabûn qels kirin. Min bala xwe dayê ku

çavên min ji ber wî awayê nêrînê û wan ronahiyan diqerimîn.

Kevirên

rê ku te digot dohnkirî bûn û tramwayên ku diçûn û dihatin di

bin şewqa lempên cadeyê de di navberine wekhev de dibiriqîn.

Rohaniya

wan lempan li ser porên dermankirî, li ser lêvên ku dibişirin

an jî li ser bazine<sup>14</sup> zîvînê di destê keçekê de dişikest û dipijiqî.

Hinekî

derengtir, tramway pir kêr bûn û bi wê şeva ku ji mêj ve ketibû

û ,di ser serê dar û lempan re reş fikir, tax hin bi hin vala bû. Cade

disa vikîvala bûbû û pisîka pêşîn derket û hêdîka derbasbû. Min

ji xwe re got ku gerek bû ku min şîv bixwara. Hustuyê min hinekî

qerimî bû û dêşiya ji ber ku min demeke baş dirêj pala xwe dabû

ser

pişta sendeliyê. Ez daketim û min nan û mekeroniya kiri, min şîva

xwe çêkir û li ser darê nigan xwar. Min xwest cixarekê li ber

pencerê

bikişînim lê germa bayî gelekî şikestibû û min hinekî sar bû. Min camên xwe girtin û dema ez vegeyriyam, ez di neynikê de çav li perçekî

masa xwe ketim. Fenera min û çend pariyên nê li ser wê li kêleka hev bûn. Min ji xwe re got ku roj roja yekşembê bû û baş bû

ew roj ber bi dawiya xwe diçû. Min got ku dayê anuha di bin axa gorê de bû, ku min ê dîsa dest bi karê xwe bikira û ku bi çend gotinên

kurt tiştekan nehatibû guhertin.

in

Min îro li nivîsgehê gelekî kar kir. Xwedanê karê min bi min re qenc derket. Wî ji min pirsî Xwedê bike ez ne pir westiyayî bûm û xwest bizanîbadayê çend salî bû miribû. Ta min xwe şaş nekira min got "Li dor şêstî" û ez nizanim çima lê ji min re xuyabû wek ku dilê wî ket cih û ku ew yek ji bo wî tirseke qediyayî bû.

Li ser masa min resîd û senedên malên barkirî kom bûbûn. Min li wan gişan nerî, gerek bû ku min ew tev bikirana. Berî ku ez ji nivîsgehê

ji bo fravîne derkevim, min destên xwe şuştin. Ez nîvro gelekî ji şuştina destên xwe hez dikim. Kêfxweşiya ku ez êvaran di di vê şuştinê de dibînim ji kêfxweşiya nîvro bi gelekî kêmtir e. Rojê gişî her kes destê xwe bi wê destmala ku li dora xwe digere zuha dike û

ji ber vê yekê jî ew gelekî şil dibe. Min ev têbînî rojekê ji xwedanê karê xwe re got. Wî li min vegeyrand ku ev yek ji binî ve naxwoş bû, lêbelê dîsa jî ew tiştekan bêqîmet û biçûk bû. Saet duwanzdeh û nîvan,

hinekî dereng, ez bi Emmanuelê ku di beşê şandinê de kar dike derketim. Buro li kêleka deryayê ye û me ji xwe re bîstikekê li gemiyên baran mêze kir. Bender di bin agirê roka xurt de diqijijî. Wê kêlîkê, kemiyonek di nav şerqeşerqa zengîran û guregura motorê

xwe de hat. Emmanuel ji min re got "Tu dibê çî em xwe bavêjinê" Min yek nekir dudo û min dest bi bazdanê kir. Kemyonê li pêşiya me xist û me bi bazdan da di1. Ez di nav gurregurrê û tozê de fetisî bûm, lê min nema bala xwe da tu tişê. Min tenê dizanîbû ku min di ber pozên gemiyên rawestiyayî bazdida. Mancenîq, barhilgirên

hesinî û stûnên gemiyan li ser aso dîlan dikirin û di nav wê beza min de geh bilind dibûn geh dadiketin.

Ez yê pêşîn bûm ku min xwe gihand kemyonê û bi wê bezê, min xwe avêt paşiya wê. Paşê, min alîkariya Emmanuel kir ta ku ew jî rûnişt. Bêhna me çikiya. bû û kemyon li ser kevirên xwaromaro geh bilind dibû geh di nava tozê û germa rokê de diçû xwarê.

Emmanuel

hingî dikeniya dihat bifetisiya.

Em di nav xwêdanê de gihaştin bal Cêleste. Ew herdem bi zikê xwe yê mezin, bi berdilka xwe û bi simbêlên xwe ên spî li wir bû. wî ji min pirsî: "Xwedê bike dîsa jî tu baş bî". Min jê re got ku erê ez baş bûm û ji birçina çîzeçîza nava min bû. Min xwarina xwe bi lez xwar û piştî min qehwek vexwar. Paşê ez vegeriyam malê û ji ber ku min pir şerab vexwaribû, ez hinekî ji xwe re razam. Dema ez ji xew rabûm, dilê min bijiya çixarakê. Wextê min teng bû û min bazda ta min xwe gihand tramwayekê. Min piştî nîvro giştî kar kir.



Hundirê nivîsgehê gelekî germ bû û êvarê ez kêfxweş bûm piştî  
karê

xwe hêdî hêdî li ser sekûya bendera deryayê ji xwe re .ber bi malê  
ve diçûm. Asman kesk bû û min xwe mirovekî kêfxweş, bextiyar  
didît.

Lê li gel wê kêfxweşiya xwe, ez dîsa seraser vegeyriyam malê ji  
ber ku min dixwest ji xwe re petatên kelandî çêbikirana.

Ez di' nava tariyê de bi pelikan hildikişiyam jorê dema ez û kalê  
Salamano, cîranê eynî qat, em li bin guhên hev ketin. Ew bi kûçikê  
xwe re bû û ev heşt salên wan in ku mirov herdem wan bi hev re  
dibîne. Li espanyolê wî nexweşiyê pûstê peyda bûye ez bawer  
dikim

navê nexweşiyê sor e. Ji ber vê nexweşiyê piraniya pirça wî diweşe  
û qaşirine bi rengê taiî ji hemû laşê wî yê kulbûyî radibin. Ji  
ber ku ew herdu herdem di odake teng de wilo bi hev re dijîn, Kalê  
Salamano, dawiya dawî, bû wek sehê xwe û qaşirine bi ser sore ve  
ji

rûyê wî radibin û ji hemû pirça wî tenê çend tayine zerik bi serê wî  
ve mane. Tiştê ku kûçik ji xwediyê xwe girtiyê şêweya meşa wî ye.  
Ew wek kalê Salamano piştî xwe hema wilo xwar dike û poz û  
hustuyê

xwe ber bi pêş ve dirêj dike. Yê li wan binere ê bêje ew ji tuxmekî  
ne û wekhev in lêbelê ruhê wan ji hev dire. Kalê Salamano her  
roj du caran kûçikê xwe derdixe derve û wî digeiîne, carekê saet  
yanzdehê danê sibehê û cara duduyan saet pêncê êvarê. Ev heşt  
salên

wan in ku wan tu caiî rêya xwe neguherandine û herkes li cada  
Lyonê dikare wan bibîne. Di destpêkê de, kûçik kalê Salamano bi

dû xwe ve dikişkişîne ta ku kalo dilukume. Wê gavê kalo dest pê dike

lê dixwe û peyvên dijûn û pîs jê re dide. Ji tirsê nava xwe kûçik zikê xwe dide erdê û dibê dora kalo wî bi dû xwe dikişkişîne. Dema kûçik lêxistin û xerberan ji bîr dike, ew dîsa dide pêşiya xwediyê xwe û wî bi dû xwe ve dicircirîlie. Wilo jî carek din lêxistin lê dibê û gotinên pîs jê re tên kirin. Paşê Salamano û sehê xwe li kêleka cadê

dirawestî û li hev dinêrin, kûçik bi tirsek mezin û mirov bi qehr û kîn. Her roj jî karê wan eve. Dema kûçik dixwaze bimîze, kalo rê nadê û wî bi dû xwe ve dikişîne. Kûçik li dû xwe rêzeke ji peşkên biçûk ên mîzê dirêj dike. Eger kûçik di odê de bimîze ji xwe wê gavê

ew dîsa lêdanê dixwe û ev yek ji heşt salan de bi vî awayî berdewam

dike. Cêleste herdem dibêje ku "Guneh e, dilê gawiran bi vî kuçikî dişewite", lêbelê eger bi rasê bê ya dawî kesek xweş nizane. Dema ez li ser pelikan pêrgî wî bûm, Salamano di wê gavê de xeber

ji kûçikê xwe re didan. wî jê re digot: "P"iso! Berateyo!" û kûçik dikişkişî.

Min silav lê kir, jê re got: "şeva te bi xêr", lê wî hema xeber didan û silava min venegerand. Wê gavê min jê pirsî kûçik çi kiribû ta ew wilo bi ser de radibû. wî bersiva min neda. û berdomand: "P"iso! Berateyo!" Di tariya pelikan de, min didît ku wî xwe bi ser kûçikê xwe xwar kiribû û gerdembenda wî rast dikişkişî. Min dengê xwe bilind kir. Wê gavê, bêyî ku li min bizîviriya wî qehra xwe daqurtand û di nav diranên xwe de li min vegehand: "Ma ew

hêna li wir ein Paşê ew derket û wî seh bi dû xwe de kişand. Seh bi îskînî li ser her çar lepên xwe da dû.

Di eynî wê gavê de êranê min yê qatê dudyan derbas bû. Li taxê tê gotin ku ew li ser jinan dijî. Lêbelê dema yek jê dipirse ew çi karî dike, ew vedigerîne ku ew "enbardar" e. Bi awakî giştî, kêfa kesekî li taxê jê re nayê. Lê ew gelek caran bi min re diaxife û ji ber ku ez li gotinên wî guhdarî dikim, carinan jî tê bal min hinekî dimîne. Ez tiştên ku ew dibêje tiştine balkêş dibînim û bi xwe tu sebeb nabinim

ta bi wî re deng nekim. Navê wî Raymond Sintes e. Ew têra xwe kinik e, bi navpişteke fireh e û bi pozekî mîna pozên boksiyan e. Ew herdem li çekên xwe pir miqate ye. Dema wî behsa Salamano

û kûçikê wî kir, wî jî ji min re got: "Çi gunehê mirov bi vî tişto tê!" wî ji min pirsî ka ez ji danûstandina Salamano bi kûçikê wî re aciz dibûm an ne, min vegerand û got na .

. Em bi hev re hilkişiyên û min ê dev jê berdaya dema wî ji min re got: "Sosîsek û şerab li bal min hene Ma tu nayê bi min re pariyekî 30

naxwî? ..". Min ji xwe re got ku wê vexwandinê ê min ji çêkirina xwarinê azad bikira û min got erê. Raymond jî tenê di odake bi metbexeke bê pencere de dijî. Di ser serê textê wî re, firişteyekî spî

û pemba ji macûna mermerê û sûretine pehlewanan û du an sê k1îşên

jinên tazî bi dîwêr ve ne. Ode gemarî bû û Raymond textê xwe rast nekirbû. wî pêşî lempa xwe ya donê gazê vexist, paşê wî ji bêrîka

xwe paçek ne pir paqij derxist û li destê xwe yê rastê girêda. Min . jê pirsî çî bûbû û wî ji min re got ku ew û mirovekî girrê xwe jê venedikir

rabûbûn hev.

"Tu dibînî, axayê Meursault, wî ji min re got, ez bi xwe li şer nagerim

lêbelê ez mirovekî sergerm im. Yê din ji min re got: "Eger tu mêtê ji tramwayê dakevî." Min jê re got: "De bes e ha ! Li ciyê xwe rihet rûnê." wî ji min re got ku heyvanê mêtaniyê di nava min de tunebû. Wê gavê ez daketim û min jê re dîsa got: "Kuro bes e ! ev ji te re çêtir e. Eger tu girrê xwe ji min ve nekî ez ê te baqil bikim."

wî li min ve gerand "Tu ê min ji çî baqil bikî?" Wê gavê min nema xwe girt û hema miştêk lê da û bi wê miştê re ew da erdê. Min xwe daqul kir ku ez wî rakim lê hema wilo li ser erdê wî pehîn li min da. Wê gavê min carekê bi çoka xwe û du caran bi miştê destê

xwe lê da û rûyê wî di nav xwînê de hişt. Min jê re got te hîna divê an te têra xwe lêxistin xwariye. wî got "erê bes e". Sintes çîroka xwe ji min re digot û di eynî wextê de paçê destê xwe rast dikir. Ez li ser text rûniştî bûm. wî ji min re got: "Tu dibînî ku ne min girrê xwe tê da. wî bela xwe firot min." Ew yek rast bû û min heq da wî. Wê gavê wî ji min re diyar kir ku wî dixwest ku bi rastî li ser vê pirsê

min şîretek lê bikira. wî got ku çî ye ne çî ye ez mirovekî têgihaştî bûm, ku min têra xwe dunya bi çavên serê xwe dîtibû, ku min dikarîbû

alîkariya wî bikira û ku bi wê alîkariyê jî, ew ê bibûya dostê

min. Min tiştekek negot û wî dîsa ji min pirsî ka bê dilê min hebû ku ez bibûma dost birakê wî. Min jê re got ku ev yek ji bo min tiştekekî wekhev bû û bi wê bersivê wî kêfxweş xuya kir. wî rabû sosîsê xwe derxist û di miqilkê de birajt. Bêyî ku deng ji tiştekekî bianiya, wî mase

raxist û üwan, sênîk, kêr û çetel û du şûşên şerabê danîn ser. Paşê em li ser sifra xwarinê rûniştin û wê gavê wî dest bi çîroka xwe kir. Ew pêşî hinekî dudilî bû lê dest pê kir. "Min xanimêk nas kir ...ez çawa ji te re bêjim ew yarika min bû ... û ew mirovê ku min pê re pevçînîbû birayê wê bû. Raymond ji min re got ku jinik li ser perên wî dijiya. Tevû ku tu gotin ji devê min derneketin, wî di ô de Lêzêde

kir û got ku dizanîbû xelkên taxê çî li ser wî digotin, lê ji vî alî, ew ji xwe serrast û bawer bû, wî dizanîbû ku ew enbardar bû. "Ez serê te neyêşînim, wî got, min bala xwe dayê ku ez dihatim xapandin." Perên ku wî didane wê bi zorê têra wê dikirin. wî bi xwe kiriya oda wê dida û, ji bo xwarin û vexwarinê, wî rojê bîst frang didane wê. "Sê sed frang ji bo odê, şeş sed ji bo xwarin û vexwarina

wê û her demekê, min cotek gorên tenik jê re dikiri, ev dibû hezar frang. Tevû vê yekê xanimê kar nedikir û bi ser de jî ji min re digot ku ne bes bû, ku wê bi wan peran nikarîbû debara xwe bikira.

Lê ne ku min jê re nedigot, min digot: "Ma çima tu bi kêmanî nivê rojê kar nakî? Tê wilo ji bo kirîna tiştên hûr û mûrên xwe barê min sivik bikî. Ma ne vê mehê min destek kiras ji te re kirîye, ez rojê bîst

frangan didime te, ez kiriya xaniyê te didim û bi ser de jî tu xêrê li

min dikî xiyar." Lê wê kar nedikir, herdem digot ku wê nikarîbû kar bikira, ta rojekê ez têgihaştim ku wê derew li min dikirin û ez dixapandim. "

wî Wilo ji min re çîroka xwe got çawa wî rojekê bilêtek bextkişiyê di çentê wê yê destan de dît û çawa wê nikarîbû bigota çilo û bi çî peran wê ew kirîbû. Hinekî paşê, wî li bal wê kaxezek dîtibû û li gor wê kaxezê wê du bazin li hember peran razandibûn û xistibûn rihanê. Ta wê roja kaxezê, wî ji binî ve nizanîbû ku ew herdu bazin li bal wê hebûn. "Min nas kir ku wê ez dixapandim û ji ber vê yekê min dev jê berda. Lêbelê berî ku ez dev jê berdim, min lê xist. Paşê min hemû rastiya wê di rûyê wê de jê re got. Min jê re got ku wê tenê tişteke dixwest û ew tiştê kêfxweşiya ew tiştê di nav şeqê wê de

bû. Wek ku min jê re got ez anuha ji te re dibêjim, axayê

Meursault:

"Tu nabînî ku çavên xelkê bar nabe ku ez vê kêfxweşiyê, vê bexteweriyê didime te. Lê rojekê ji rojan ew kêfxweşiya tu di nav de

bûyî wê bê bîra te û tu ê poşman bibî."

wî têra wê lê dabû, dem û lêvên wê di nav xwînê de hiştibû. Berê wî lê dida lê ne bi wî hawî. Min tenê çend tep lê dixistin lê min ew nedêşand. Ew hinekî diqîriya. Min depên li ser rûyê pencerê digirtin

û wilo jî tiştê dibûn wek berê. Lêbelê anuha tişteke cidî ye û, di baweriyê min de, min pir ew nekuta û pîs nekir."

wî ji min re diyar kir ku çûnki wî bawer dikir ku bi rastî wî heqê wê baş nedabûyê, wî dixwest min pêşniyariyek lê bikira. Lempê cama

hawîrdora xwe tenî dikir û wî dîroka xwe di wê navê de birrî û fitîla wê rast kir. Min tiştekan nedikir, tenê lê guhdarî dikir. Min nêzîkî

litrek şerab vexwaribû û agir bi çênikên min ketibû. Ji ber ku min pakêta xwe tev kiribû min çixarên Raymond dikişandin.

Tramwayên

dawîn derbas dibûn û wan dengên anuha çels bûyî ên dorbijêr bi xwe re dibirin. Raymond berdomand û got tiştê ku bêhna wî teng dikir ew bû ku "wî hêna bêriya ganên wê jinekê dikir", lê li gel vî tiştî, wî dixwest tore bi serê wê de bianiya. Pêşî, wî xwestibû ew bibira hotêlekê û paşê bang polîsê dij-qehpetiyê bikira. Wî dixwest wilo ew bihetikanda û bihiştta navê wê têteta qeydên polîs ta ku ew

wek gewendakê bihata nas kirin. Wî alîkariya hevalên "navendê" xwestibû. Wan tu çare ji bo vê yekê peyda nekiribûn. Wek ku Raymond

da rûyê min, giring bû ku ew ji navendê bû. Wî ji wan re gotibû ku ew ji wan bû û gerek wan tiştekan ji bo wî bikirana. Wan wê gavê tenê pêşniyariek kirin: "wan dikarîbûn ew nîşan bikirana". Raymond bi ya wan nekiribû ji ber ku daxwaziya dilê wî tiştekan din bû. Ew ê bifikiriya, li çareyek çêtir bigeriya. Berî her tiştî, wî dixwest

tiştekan ji min bixwesta lê pêşî wî dixwest bizanîba nêrîna min li ser vê

çîrokê çî bû. Min lê vegerand ku tu nêrîn û dîtînen min tunebûn lêbelê min ew çîroka hanê balkêş didît. Wî ji min pirsî ka min bawer

dikir ku ew hatibû xapandin û ji min re eşkere bû ku erê tiştêkî  
wilo

di wê navberê de hebû. wî ji min pirsî ka ez di şûna wî de bûma

33

min ê çî bikira, gelo min ê ew keç biedeb bikira. Min jê re got ku  
min nizanîbû min ê çî bikira lê ez têdigihîştim ku wî dixwest ew  
bêşanda

û tola xwe hilaniya. Min hinek şeraba din vexwar. wî çixarak  
vêxist û fikra xwe ji min re rave kir. wî dixwest nameyek "Bi  
pehînan

û di eynî wextê de bi tiştên ku ê bihiştina ew poşman bibûya"  
binivîsanda. Paşê, dema ew ê bihata, ew ê pê re razaya û "di nav  
ciyan

de, di deqa wêter bikira," wî ê tif nav çavên wê bikira û berdaba  
wê. Min dît ku jinik bi wî awayî bi rastî ê bihata pîskirin. Lê  
Raymond

ji min re got ku wî bi xwe nikarîbû nameyeke li gora dilê  
xwe binivîsanda, û ji ber vê yekê, wî bîra min biribû û dixwest ku  
min ew name di şûna wî de binivîsanda. Ji ber ku min tiştêk  
nedigot,

wî ji min pirsî ka ez ê aciz nebûma bi nivîsandina wê namê.

Min got na.

wî wê gavê piyalek din şerab bi ser gewriya xwe de kir û rabû ser  
xwe. wî sênî û perçê sosîsê sarbûyî ku ji ber me mabû da alî. wî  
cawê

şimakirî li ser masê baş paqij kir. wî ji çaviyeke masa şevê kaxezek  
damkiiî, zerfeke zer, qelemdanek biçûk ji textê sor û hibirdanek  
çarqorzî bi hibirek şîrikî derxist. Dema wî navê jinê ji min re



got, min nas kir ku ew Ereb bû. Min name nivîsand. Min ew nivîsand

û çî hat ber devê min min got, lê dîsa jî, ta ji min hat, min ew li gora dilê Raymond nivîsand ji ber ku tu sedem nebûn ta ku min ev yek nekira. Paşê, min ew name bi dengê bilind jê re xwend. wî li min guhdaiî kir û di ber re cixara xwe kişand û serê xwe bi erêyî hejand. Paşê wî xwest ez nameyê careke din jê re bixwînim. Name gelekî li gora dilê wî bû û wî ji min re got: "Min dizanîbû ku te dunya xweş nas dikir". Di destpêkê de min bala xwe nedabû wî ku wî ji min re di şûna "Hûn" de digot "Tu". Tenê gava wî got "Anuha, tu bi rastî dostbirakê min î", ku ez behetî bûm û ev yek li ber guhên min tişteki xeiîb bû. wî hevoka xwe dubare kir û min lê vegerand: "Erê". Hevaltî an ne havaltiya bi Raymond re jibo min bi xwe tişteki wekhev bû' lêbelê li ser rûyê wî eşkere bû ku ew bi hacetî

wê hevaltiyê bû. wî name imze kir û me şerab tev kir. Paşê em demekê bêdeng man û me tenê wilo cixarên xwe dikişandin. Li derve dunya kerr û bêdeng bû û di wê bêdengiyê de dengê tnimbêleke

ku gihaşt guhê min û min got: ~Dereng e". Raymond jî wilo bawer bû û ji min re got ku dem zû dibuhurî bû û gotina min di ciyê xwe de bû. Ez ji xewa ketibûm lê ji min nedihat rabûma ser xwe û min berê xwe bida malê. Bêguman li ser rûyê min xuya bû ku ez ji hal ketibûm ji ber ku Raymond wê gavê ji min re got ku gerek hayê min ji miri hebûya. Pêşî ez tê ne gihaştim wî behsa çî dikir

û wilo jî wî ji min re got ku wî bihîstibû ku dayika min miribû lê ku ev yek her ê rojekê ji rojan biqewimiya. Baweriya min jî bi xwe

ev bû.

Dema ez rabûm ser xwe, Raymond bi dilgermî destê min di nav destê xwe de guvaşt û got ku dilê mêran herdem bi hev re rast bû.

Ez derketim û min derî li dû xwe girt. Di nav wê tariya ku xwe li pelikan pêçan dibû ez hinekî li ber devê deriyê wê mam. Xanî bêdeng

bû û ji jêra pelikan hilmeke nediyar û nem ber bi jor ve heldikişiya.

Tenê dengê gihaşt min; dilê min lêdida, xwîn ber bi qehîle serê min dajot û zingînî ji ber guhên min dianî. Ez bêliv mam lê di oda kalê Salamana de, kûçik bi dengê kûr kir îskeîsk.

IV

Min heftiyê gişî baş kar kir. Raymond hat bal min û ji min re got ku wî name şandibû. Ez û Emmanuel em du caran bi hev re çûn sînemê

û Emmanuel bi xwe herdem tişteki ji film tènagihêje û gerek e ez hercar jê re rave bikim çî li ser perdeya spî derbas dibe. Do şemî

bû û wek min û Marie me li hev kiribû ew hat bal min. Wê kirasekî xweşik bi xêzên sor û spî li xwe kiribû, şimikine çermînî xistic bûn nigên xwe û dilê min gelekî bijiya wê. Memikên wê ên step kirasê

ser sîngê bilind dikirin û tava rokê rûyê wê sorgulî kiribû. Em li otobûsê siwar bûn û çend kîlomitran ji bajarê Cezayirê em çûn kêleka

deryayê. Li wê derê teht û zilan ji aliyê erdê xwe li dora avê di-  
35

pêçandin. Roka çarê piştî nîvro ne gelekî bi tîn bû, lê ava deryayê şîrgermî bû û li ser rûyê wê pêlên biçûk û dirêjokî bi nermî ber bi

erdê dihatin. Marie min hînê lîstikekê 19r. Lîstik ew bû gerek min li ser zik ajnê bikira, lêvên xwe di ser serê pêlan re bibira û devê xwe tije kef bikira. Piştî gerek min xwe bavêta ser piştê, rûyê xwe ber bi .

asmanan ve bikira û ew kef ji devê xwe bipijiqanda. Tiştê ji nav lêvên

min î guvaştî dipijiqî dibû wek tentenên ji kêle, li ber ba belav dibû û bi'ser rûyê min wek baranek şîrgermî dihat xwarê. Ava deryayê

pir şor bû û wê şorbûnê piştî demeke ne pir dirêj agir bi devê min xistibû. Marie xwe wê gavê gihande min û di nav avê de xwe bi

min ve zeliqand. Wê devê xwe xist devê min, bi zimanê xwe agirê bi lêvên min ketibû vemirand û me bêhnikekê wilo di nav pêlan de xwe bi hev re gindirand.

Dema me li kêleka avê çekên xwe li xwe kirin, min dît ku Marie li . min dinêrî û di nêrînên wê de pêtên daxwaziyê diçirisîn. Min ew maç kir û ji wê gavê û vir de, me nema dengê xwe kir. Min ew ber bi xwe ve kişand û me herduyan berê xwe bi lez da rawestgeha otobûsê.

Me xwest em zû vegeyriyana bal minta me xwe bavêta nav ciya. Min pencera xwe vekirî hiştibû. Rokê laşên me dax dabû û şeva havînê di ser laşên me de diherikî û bi me pir xweş bû.

Marie danê vê sibehê li bal min ma û min jê re got ku me ê firavîn bi hev re bixwara. Ez daketim goşt bikirim û gava ez vegeyriyam û bi pelikan hilkişiyam, dengê jinekê ji oda Raymond gihaşt guhên min. Hinekî derengtir, kalê Salamano bi ser kûçikê xwe de rabû û

dengê binê solan û şerqîna çend sîlan li ser textê pelikan li ber guhê  
me peyda bû û: "P'iso, berateyo". Paşê ew derketin çûn ser cadê.  
Min çîroka kalê Salamano ji Marie re got û ew keniya. Wê pêjameke  
min li xwe kiribû û zendikên çakêt li hev badabûn. Bi wî kenê wê dîsa dilê min bijiya wê. Piştê wê ji, min pirsî ka min jê hez dikir. Min lê vegerand ku mana wê yekê tune bû, lê min jê re got ku min bawer nedikir ku min jê hez dikir. Bi wê yekê xemgîniyê li ser rûyê wê diyar kir lê dema wê dest bi çêkirina xwarinê kir, kênê wê dîsa ne ji ber tiştê hat û wilo jî min ew maç kir. Wê gavê dengê pevçûnekê  
ji oda Raymond dest pê kir û bilind bû.  
Pêşî dengêkî tûj, yê jinekê hat û paşê dengê Raymond. Wî digot: "Te ez pîs kirim, te ez pîs kirim. Ez ê te hîn bikim çawa tê carek din min pîs bikî." Paşê dengê kurpineke nizim hat û jinikê kir qîrîn, lêbelê wê wilo kir qîrîn ku di ô de hemû tar li devê deri kom bû. Ez û Marie jî em derketin ber devê deri. Jinê hema dikir qîrîn û Raymond jî her lêdida. Marie ji min re got ku ew tişt pir dijwar bû û min dengê xwe nekir. Wê ji min xWest ku ez herim bang polîs bikim,  
lê min jê re got ku ez ji polisan hez nakim. Lêbelê polîs dîsa jî di wê gavê de hat. Lûlekêşê ku li qatê duduyan bi kirê rûdinê çû ew  
anî. Dema polîs li deri xist, deng di cih de hate birrin. Lê deri venebû  
û yê polîs cara duduyan bi hêrs lê da. Piştî demekê, jinikê dîsa dest bi qîrînê kir û Raymond rabû deri vekir. Cixara wî di nav lêvên

wî de, wî xwe bi derewan dikenand wek ku hayê wî ji tişteki tunebû.

Keçikê xwe zer kir deri û bi lez ji polîs re got ku Raymond lê xistibû. Yê polis ji Raymond pirsî: "Navê te" û Raymond vegerand. Polîs got: "Cixara xwe ji devê xwe derxîn dema tu bersiva min didî" Raymond dudilî bû û nizanîbû cixare derxista an na. wî li min nêri û wilo jî ew ji devê xwe dernexist. Wê gavê yê polîs got şiring û

bi hemû destê xwe sîlak tûj li navçavê wî da. Bi wê sîlê cixare pekiya

û çend gavan dûr ket. Rûyê Raymond qulipî, lêbelê wî dengê xwe nekir û paşê bi dengê sistî melûlî ji polîs xwest ka dikarîbû rahişt

quncika cixara xwe. Polîs bi hişkî destûr dayê û berdomand: "Lê careke din tê xweş bizanibî ku polîs ne qeşmerê te û bavê te ne." Keç hîna digiriya û wê car din ji polîs re got: "Wî li min xist. Ew qewad e." Raymond wê gavê pirsî: "Ev çi ye, axayê Polîs, ma li gor qanûnê dibe ku ji mirovekî re bê gotin ku ew qewad e?" Yê polîs bersiva wî neda û bi femandaii lê vegerand û jê xwest" wî devê xwe bigirta". Raymond nema zanîbû çi bikira çi nekira û berê xwe ber bi keçikê ve kir û got: "Xwedê ji min û te re kerim e, lê, ma ez ê vê yekê ji te re bihêlim?" Polîs jê xwest wî ew devê hanê bigirta û

37

got ku keç gerek bi rêya xwe de biçûya û Raymond gerek di oda xwe de bimaya ta ku polîsyanê bişanda dû wî. wî gotina xwe ajot û ji Raymond re got ku gerek wî ji ber xwe û bavê xwe şerm bikira

wilo serxweş bûbû û dileriziya. Raymond devê xwe vekir û li yê  
polîs  
vegerand: "Ez ne serxweş im, axayê polîs. Tenê sawa te di dilê  
min de dihêle ez wilo bilerizim. Ev yek ne bi destê min e." wî  
deriyê  
xwe girt û herkes vegeriya mala xwe. Min û Marie me amedekirina  
firavînê tev kir lê ew ne birçî bû û bêje ku hema min tenê ew  
xwarin giş xwar. Ew saet yek rabû ser xwe, çû û ez jî hinekî ji xwe  
ra razam.  
Nêzîkî saet sisiyan Raymond li deriyê min xist û buhurî hundir.  
Ez ji nav ciyan ranebûm û ew li ser kêleka textê min rûnişt. Ew  
demekê  
bedeng ma û min ji wî pirsî ka çîroka wî çawa derbas dibû.  
wî ji min re got ku wî ya dilê xwekiribû, lêbelê piştî wê yekê, keçê  
sîlak daweşand wî. Piştî wê sîlê, Raymond têra wê lê xist û min  
dawiya  
çîrokê bi çavên serê xwe dîtibû û ne giring bû wî ew ji min re  
bigota. Min jê re got ku di baweriya min de ew keç gihaştibû heqê  
xwe û wilo jî gerek ew bi kêf bûya. wî jî wilo bawer dikir û got ku  
polîs bixwesta nexwesta keçikê lêxistina xwe xwaribû û nikarîbû  
nehişt  
ku ew lêxistin lê bibûya. wî berdomand û got ku wî xweş polîs  
nas dikirin û dizanîbû çawa bi wan re bida û bistanda. wî ji min  
pirsî ka ez li bendî wî bûm ku piştî wê sîla hanê wî jî yek  
daweşanda  
yê polîs. Min lê vegerand ku ez ne li bendî ru tiştî bûm û min bi  
xwe ji polîsan hez nedikir. wî ji min xwest ku em seriyekî bi hev re  
derkevin. Ez ji nav ciyan rabûm û min dest pê kir porê xwe şeh kir.

wî ji min re got ku gerek ez bibûma şahidê wî. Ew tişt bi xwe ji bo min wekhev bû lê min nizanîbû ka min ê li polîsxa nê çî bigota. Li gor gotina Raymorid bes bû min tenê bigota ku wê keçê ew pîs kiribû.

Min qebûl kir.

Em derketin û Raymond min vexwand û piyalek konyak da min. Paşê wî xwest ku me hinekî bi bilyardo ji xwe re bilîsta. Zora min ji ber tişteki pir hindik çû. Piştî bilyardoyê dilê wî hebû em bi hev re biçûna kerxanê. Min nexwest ji ber ku ez ji vî tiştî hez nakim. Wê gavê em hêdî hêdî ber bi malê ve geriyan û di rê de wî ji min re got çiqasî kêfa wî li ci bû ji ber ku wî dawiya dawî heqê yarika xwe dabû

wê. Min didît ku Raymond bi min re pir qenc bû û min ji xwe re got ku ew dema me bi hev re derbas kiribû ne xerab bû.

Min ji dûr ve kalê Salamano li ber devê derî dît. Ew weke ku di hundirê xwe de bicoşiya ji min re xuya bû. Dema min nêzîkayî li wî kir, min bala xwe dayê ku kûçikê wî ne pê re bû. Kalê Salamano li hawîrdora 'xwe dinerî, li dora xwe dizîM, çavên xwe di tariya dalanê

de digerand, bêyî hişê xwe gotinine bêserî û bêbinî di nav diranên xwe de dicûtin, dîsa bi çavên xwe ên sor û biçûk li cadeyê digeriya. Dema Raymond jê pirsî çî bela wî bû, wî seraser tu bersiv neda. Dengê wî xweş nedigihast min lê wî di ber xwe de digot: "Pîso, berateyo" û bêhedan diçû û dihat. Min ji wî pirsî kûçikê wî li kuderê

bû. wî ji nişkê ve li min ve gerand û got ku ew çû bû. Paşê zimanê wî xweş geriya û wî li ser hev got: "Min ew wek her carê bi xwe re bir "Kêlgeha Tevgeran". Kes li dora temaşegêhên bajarê lîstikan

wek axê bûn. Ez li ber "Qehremanê revê" rawestiyam û min ji xwe re temaşe kir. Dema min xwest ji wê deverê herim, min dît ku ew ne li wir bû. Min bi xwe ji mêj ve dixwest zincîreke biçûktir ji bo hustuwê wî bikiriyay. Lê min ji ku bawer dikir ku vê berata hanê wê rojekê biçûya."

Raymond wê gavê jê re rave kir ku belkî kûçik xwe winda kiribû lê ew ê vegeriya. wî çend nimûne li ser kûçikan anî û got ku ew deh kîlomitran meşiyabûn, dîsa li xwediyên xwe vegeriyabûn. Lê van gotinan dilê kalo nexistî cî û eşkere bû ku ew di nava xwe de coşiya. "Ez dizanim ew ê wî ji min bistînin. Ma hûn têdigihêjin? Ew ê wî ji min bistînin. Ax! Xwezî ew rastî şîrhelalekî bihata. Lê Xwedêyo ez ê çi bêjim, ez dizanim ku çara vê yekê tune. Dilê herkesî

ji pîrzişkên wî li hev dikeve. Polîs wê wî bigirin, çare ji vê yekê re tune." Min wê gavê jê pîrsî çima ew nedîçû bal polîs û got ku cîyekî

wan ji bo sehên wî û bêxwedî hebû. Piştî dayîna hinek pere, wî

dikaribû kûçikê xwe ji wê deverê derxista. wî xwest bizanîbûya eger

ew perene pîr bûn, û ji ber ku min bersiva wê yekê nizanîbû, bêhna

wî teng bû û wî bi qehir got: "Ez ê çawa peran ji bo vê beratê bidim?

De bila bitemire!". wî dîsa dest bi xeberan kir ji sehê xwe re da. Raymond bi ken buhurî hundir û min da dû. Li ber devê deriyên

eynî qat, me dev ji hev berda. Piştî demekê, dengê payênka10



hatine guhên min û wî li deriyê min xist. Gava min derî vekir, ew demekê wilo bêdeng ma û paşê got: "Bibuhure, bibexşe". Min jê re got fermo derbas be, lê wî nexwest û li ber devê derî ma. wî serê

xwe xistibû ber xwe, li pozê solên xwe dinêrî û destên wî ên tev bipizik

dilerizî. Beyî ku serê xwe ji ber xwe rakira wî ji min pirsî: "Bêje axayê Meursault ku ew ê wî ji min nestînin. Ew ê wî li min vegeînin.

Ma ez ê bêyî wî çî xweliyê li serê xwe bikim, bi kuderê herim?"

Min jê re got ku polîs bi xwe kûçikên bêxwedî sê rojan li bal xwe li hêviya xwediyên wan dihêlin û piştî wan sê rojan çî dikirin ew bi kêfa xwe bûn. wî dengê xwe nekir, li min nêrî û paşê ji min re got: "Bi xatirê te, şeva te bimîne xweş". wî deriyê xwe gin û paşê

ew hema diçû û dihat. Qirçînî ji textê wî hat û ji wî dengê hûr î nizim, ji wî dengê bi taybetî ku ji dîwarê navberê re gihast min, min

nas kir ku ew digiriya. Ez nizamim çima diya min wê gavê hate bîra min, lê gerek bû ez roja din zû ji xew rabûma. Ez ne birçî bûm û bê şîv ketim nav ciyan.

v

Ra:ymond telefonî ciyê karê min kir. wî ji min re got ku hevalemî wî (wî ji wî re behsa min kiribû) min veduxwand roja yekşemê li xaniyê

wî nêzîkî serbajarê Cezayira li kêleka deryayê derbas bikira. Min lê vegeîrand ku ew yek bi dilê min bû lêbelê yekşemê min soz dabû

hevalekê. Raymond di cî de ji min re got ku wî ew jî vedixwand.

Jina

hevalê wî ê pir kêfxweş bibûya eger xwe tenê jin di nav birrek mêr de nedîta.

Ez dizanim ku kêfa xwedanê kar nayê ku em ji xwe re bi telefonê biaxifin û min xwest seraser bibirriya lê Raymond xwest min hinekî lê guhdarî bikira. wî got ku wî dikarlbû êvara rojê ew nama vexwandinê

bigihanda min, lêbelê wî dixwest hayê min ji ~tine din

hebûya. Rojê gişî birceke Ereban dabûn dû wî û birayê yarika wî ya kevn di nav wan de bû. "Eger êvarê dema ru vegeerl ru wî li kêleka malê bibînî, bila hayê min jê hebe." Min got erê baş e.

Pir wext di wê navberê re ne buhurî xwedanê kar şand dû min û wê gavê dilê min teng bû ji ber ku min bawer kir wî ê ji min bixwesta

min telefonên xwe kêm bikirana û ez bêtir bi karê xwe daketama.

Lê wî ne ji bo wê yekê şandibû dû min. wî anî ser zimên ku wî ê bi min re behsa bemameyekê bikira li gel ku ew bername hêna

di serê wî de ne pir diyar bû. wî tenê dixwest bizanîbûya nêrina min li ser wê çî bû. Dilê wî hebû ku wî buroyek li Parisê vekira ta ji wê derê, ji ciyê cî û seraser bi şerlkatên mezin re bida û bistanda û wî dixwest bizanîbûya ka min xwe ji bo wî karî û wê berpirsiyariyê amede didît. vî karê nû ê bihiştta ez li Parisê bi cî bibûma û bi ser de jî di salê de ez ê têra xwe bigeriyama, biçûma her derê. "Tu xort

î, û ez bawer im ev jiyana hanê ê dermanê dilê te be". Min got ku

erê ev yek rast bû, lêbelê eger min rastiya dilê xwe bigota, ev yek ji

bo min wekhev bû. wî wê gavê ji min pirsî ka min dixwest guhertinin

mezin di jiyana min de çêbûbûna. Min vegerand ku mirov jiyana xwe ru carl naguherîne, ku jiyana hemû wekhev in û ez ji binî ve ne dijî jiyana xwe bûm. Kêfa wî ji bersiva min re nehat û ev yek li ser rûyê wî eşkere bû. wî got ku min ru carl bersiva ~tan bi awakî berbiçav nedida, ku ez li nav û dengê dunyayê nedigeriyam, ku min

.nedixwest xwe bi pêş ve bixista û ew yek di warê bazirganiyê de ~-

tekî pir kambax bû. Piştî van gotinan ez vergeriyam ser karê xwe.

Min nedixwest dilê wî bihişt, lê min nizanîbû çima min ê jiyana xwe bida bi jiyaneke din. Dema ez baş li ser vê pirsê rarniyam, min dît ku bi rastî ez ne mirovekî dijî jiyana xwe bûm. Dema ez xwendevan

bûm, min dilê xwe bi gelek ~tan xweş fikir lê dema min ji

ber bêgaviyê dev ji xwendinê berda, min zû nas kir ku ew hemû daxwaziyên zaroktiyê bi rastî tiştine vala û bêrûmet bûn.

Êvarê, dema ez ji kar derketim, Marie li ber devê derî li bendî

min bû û wê ji min pirsî ka min dixwest ew bikira. Min got ku ev yek ji bo min wekhev bû û ku, eger wê bixwesta, me dikarîbû hev bikira, çima na. Wê xwest bizanîbûya ka min jê hez dikir û, wek ku berê carekê min lê vegerandibû, min got ku ew yek tiştêkî bêmane bû, lê bêguman min jê hez nedikir. Wê wê gavê pirsî: "Na xwe çima

ru ê min bikî eger dilê te di min de rune?" Min jê re got ku ew

yek ji binî ve bêrûmet bû û eger dilê wê bixwesta, me dikarîbû ew daxwaz bi cih bikira, çima na. Ma ne wê bi xwe ew yek dixwest û ma ne min jî tenê digot erê? Wê wê gavê xwest ji min re rohnak bikira

ku hevdu anîn tiştekî pir mezin bû. Min lê vegerand û got "Na." Wê demekê nema dengê xwe kir û bêdeng li min nêrî. Paşê wê car din dengê xwe kir. Wê tenê dixwest bizanîba eger jineke din

di şûna wê de eynî wê daxwazê ji min bikira gelo min ê bigota erê. Min got: "Helbet" Bi vê bersiva min wê ji min re got ku wê bi rastî nizanîbû ka wê ji min hez dikir an na û min bi xwe nikarîbû di şûna wê de bersiva vê yekê bida. Em navberê din wilo bêdeng man, paşê

wê bi dengê nizam, di nav diranên xwe de got ku bi rastî ez mirovekî

seyrî xerîb bûm û ku bêguman ji ber wê yekê, wê ji min hez dikir, lê rojekê jî bêguman ji ber wê yekê belkî min ê bihi~ta ku ruhê

wê ji min biçûya. Min nizanîbû çi bigota û min dengê xwe nekir. Wê bi destê min girt û bi ken ji min re got ku wê dîsa jî dixwest min ew bianiya. Min vegerand ku kengî dilê wê bixwesta me dikarîbû

ew yek bikira. Min jê re behsa pêşniyariya xwedanê karê xwe kir û wê ji min re got ku wê dixwest Parîs bi çavê serê xwe bidîta. Min jê re got ku berê ez demekê li Parîsê mabûm. Wê ji min pirsî Parîs çawa bû. Min lê vegerand: "Parîs gemarokî ye. Ew tije kevok û hewşên reş e. Pûsta şeniyên wê spî û kal e."

Paşê em derketin ji xwe re geriyan. Me da ser cadeyên mezin û

em di nava bajêr re derbas bûn. Jinên derketibûn ji xwe re li ser  
cadan  
dimeşiyar xweşik bûn û min ji Marie pirsî ka wê yekê bala wê  
dikişand. Wê got erê wê dizanîbû û got jî ku wê ez îem dikirim.  
Me herduyan demekê nema dengê xwe kir. Lêbelê min dixwest ku  
ew bi min re bima û jê re got ku me dikarîbû bi hev re li bal  
Cêleste  
şîv bixwara. Dilê wê hebû ne ku tunebû lêbelê karekî wê hebû.  
Nêzîkî  
malê min xatir jê xwest. Wê li min nêrî û got: "Ma tu naxwazî  
bizanîbî karê min çi ye?" Min helbet dixwest, lê nehat bîra min  
min  
jê bipirsiya û wilo jî xuya bû wê gazin ji wê yekê dikir. Gava wê li  
ser rûyê min dît ku min nizanîbû çi bigota û zimanê min ketibû  
hev, ew dîsa kenîya û wê hemû laşê xwe ber min ve anî û lêvên  
xwe  
ji bo dayîna ramûsanekê dirêjî lêvên min kirin.  
Min şîva xwe li bal Cêleste xwar. Min dixwar gava jinek kinik û  
seyr derbasî hundirê xwaringehê bû û ji min pirsî ka wê dikarîbû li  
ber masa min rûnişt. Wê helbet dikarîbû. Dema wê xwe  
tevdigerand  
livên wê hişk bûn û di rûyêkî biçûkî wek sêvê de çavên wê  
diçirisanandin.  
Wê çakê wê ji xwe kir, rûnişt û bi dilgermî nêrînen  
xwe di ser navê xwarinan re di kartê de gerandin. Wê bang  
Cêleste  
kir û bi dengê qube seraser hemû babetên xwarinên xwe  
helbijart.

Hêna sêniya pêşîn nehatibû wê çentê xwe vekir, kaxezek.biçûk î  
çarqorzî û qelemek resas derxist û wê hesab kir wan xwarinan ê  
çiqas  
pere bikirana. Paşê wê ji çentê xwe kîsikê peran derxist û tev  
bexş'işê wê ew perên hanê danîn ser masê. Di wê gavê de, sêniya  
pêşîn  
jê re hat û wê bi lez ew daqurtand. Li bendî xwarina serekî, wê  
dîsa çentê xwe vekir, qelemk resas î şîn û kovareke derxist. Wê  
kovarê  
bernameyên radioyê ên hefteyê dida û wê jinikê bi dîqet xaçeke  
biçûk li b~r piraniya wan bernameyan çêkir. Kovar ne biçûk bû,  
duwanzdeh petî bû û wê ew karê hanê bi eynî wê diqetê  
berdomand  
û xwarina xwe jî di ber re dixwar. Min xwarina xwe tev kiribû  
û wê hêna bi wê dîqetê xaçikên biçûk li pêşiya navê bernameyên  
xwe datanî. Paşê ew ji nişkê ve rabû ser xwe û, bi wan tevger û  
livên  
xwe ên hişk, wê çakête xwe li xwe kir û derket. Ji ber ku tu karê  
min tunebû û nizanîbû min ê çi bikira, ez jî derketim û min texne-  
43  
kê da dû. Wê li ser kêleka rê bi lezek mezin û bi awakî jixwebawer  
diçû bê ku li dora xwe bineriyay an rêya xwe xwar bikira û ez  
ecêbmayî  
mam. Dawiya dawîn ew ji ber çavên min ket û ez li ser şopa  
xwe vegeyriyam. Min ji xwe re got ku ew jinika hanê seyrî xerlb bû,  
lê min ew piştî bêhnikekê ji bîr kir.  
Kalê Salamano li ber devê deriyê min bû. Min ew derbasî hundir

kir. wî ji min re da nasîn ku kûçikê wî av û av çû bû. Ew çûbû  
polîsyanê,  
li hewşa kûçikên windabûyî li kuçikê xwe geriyabû lê ew  
peyda nekiribû. Kesên li wê derê kar dikirin jê re gotibûn ku belkî  
ew di bin çerxên tîmbêlekê de hatibû perçiqandin. wî pirsî ka wî  
dikarîbû ew yek li polîsyanan binasiya lê wan karmendan lê  
vegerandibûn  
ku perçiqandina kûçikan li polîsyanan ne dihat qeydkirin  
ji ber ku ew tişt her roj diqewirîn. Min ji kalê Salamano re got çima  
wî ji xwe re kûçikê din peyda nedikir, lê wî rast got dema ji min  
re  
da xuyakirin ku ew hînê kûçikê xwe bûbû.  
Ez li ser qelavîzkan li ser textê xwe rûniştibûm û Salamano li ser  
sendeliyekê li ber masê rûniştibû. Li hember min wî herdu destên  
xwe danîbûn ser çogên xwe. Kumê wî yê ji kulavekî kevn li ser serê  
wî bû û wî di ber xwe de, di bin simbêlên xwe ên zerbûyî de tiştine  
digot lê min nizanîbû wî çi digot. Ez hinekî jê aciz dibûm lê tu karê  
min tunebû û xewa min jî nedihat. Ta ku ez bêdeng nemama, min  
jê pirsine li ser kûçikê wî kirin. wî ji min re got ku piştî mirina jina  
wî wî ew kûçik anîbû bal xwe. Di xortaniya xwe de, kêfa wî pir ji  
tiyatroyê  
re dihat, wî dixwest derketa ser sahnê û di piyêsan de bilîsta.  
Gava wî leşkeriya xwe dikir, wî di leqê xwe de di piyêsên kenawer  
ên li ser jiyana leşkeriyê dilîst. Uwî karek di şerîketa ,tirên û rêyên  
hesinî de peyda kiribû û ne poşman bû ji ber ku bi saya wî karl,  
wî anuha her meh perene hindik distandin û xwediyê bazniştineke  
biçûk bû. wî kêfxweşî û bextewerl bi jina xwe re nedîtibû, lê bi  
awakî giştî, ew hînê wê bûbû û jiyana xwe wilo pê re derbas dikir.

Piştî mirina wê, wî gelekî xwe bi tenha serê xwe dîtibû. wî rojekê ji hevkarekî kargeha xwe cewrikek xwestibû û xwedî kiribû. wî ew bi 44

şîrê şûşa devmemikî şîr dabû û mezin kiribû. Lê ji ber ku seh ji mirovan

zûtir mezin dibin, ew wilo jî bi hev re pîr bûbûn. Salamano ji min re got: "Cirra wî bi xwe pir nexweş bû. Car caran ez û wî em diketin qirika hev, lêbelê dîsa jî ew kûçikê nesêle bû." Min got ku kûçikê wî ji tuxmekî baş, ji reheke kûçikên xweşik bû û Salamano bi

vê yekê pir kêfxweş xuya kir. wî berdomand: "Xwezî te ew bidîta beri ku ew nexweşî lê peyda bûbûya! Bi rastî tiştê heri xweşik di wî de pirça wî bû." Ji roja ku ev nexweşiya çerm li kûçik ketibû, Salamano

her sibeh û her êvar merhem di laşê wî giştî de dida. Lê di baweriya wî de, nexweşiya rast ya kûçik pîrbûyîn bû û herkes dizane ku dermanê pîrbûyînê tune."

Di wê gavê de ez bawîşkî bûm û kalê Salamano xwest rabûya ser xwe û biçûya. Min jê re got ku wî dikaribû hêna bimaya û ku ez li ber windabûna kûçikê wî diketim. wî min spas kir, ji min re got ku dayê gelekî ji kûçikê wî hez dikir. Dema wî behsa wê dikir, wî jê re digot "Rebena diya te". wî got ku ez gelekî li ber mirina diya xwe diketim û ku ji ber wê mirinê ez gelekî xemgîn bûm, lê min dengê xwe nekir. wî wê gavê ji min re bi lez û bi diltengî got ku wî dizanîbû

ku di taxê de xelqê rastiya min baş nizanîbûn. Wan şaş ez hukum kiribûm çima min diya xwe xistibû mala pîran, lê wî bi xwe baş dizanîbû ez çawa bûm û dizanîbû ku min gelekî ji dayê hez dikir.



Ez nizanim çima lê min lê vegerand ku ta wê gavê min ji binî ve nizanîbû

ku di tarê de behsa min bi nepakiyê dibû. Min rave kir ku çareya mala pîran. çareyek di. ciyê xwe de bû ji ber ku perên min î wilo pir tunebûn ta min ji bo dayê nexweşnêrek bigirta. Min berdomand:

"Paşê çawa bûya, ji mêj ve wê nizanîbû çi ji min re bigota  
Û ew tenê aciz dibû." -"Erê, wî got, li mala pîran bi kêmanî mirov dikarin ji xwe re hevalan bibîne." Paşê wî bexşîn û buhuiin ji min xwest. wî dixwest razaya. Jiyana wî anuha hatibû guhertin û wî nema

dizanîbû ê çi bikira çi nekira. Ew cara yekemîn bû ku wî destê xwe ji nişkê ve bi lez dirêjî destê min kir. Min destê xwe da destê bi

qaşirên zivir. Ew hêna neçûbû dema hinekî di ber xwe de keniya:  
45

"Ez hêvîdar im ku vê şevê kûçik wê nereyin. Ez herdem bawer dikim

ku ew kûçikê min e wilo direye."

VI

Yekşemê ez bi zehmetiyek mezin ji nav ciyan rabûm û ta ku Marie bang min nekir û milê min nehejand, ez heşyar nebûm. Me xwirîniya

xwe nekir ji ber ku me dixwest em zû têketana avê. Canê min giran bû û hinekî jî serê min dêşiya. Cixara min di korta devê min de tameke tal û nexweş dihişt. Marie li rûyê min nêrî û henekê xwe

bi min kir ji ber ku wê digot ku yê li min binerîya wê bigota" ez ji

nav goran dihatim". Wê kirasekî ji cawekî spî li xwe kiribû û porê Xwe berdabû. Min jê re got ku ew xweşik bû û ew ji kêfa keniya. Em daketin û me li deriyê Raymond xist. wî deriyê xwe venekir û bi dengê bilind got ku ew li ser derketinê bû. Ji ber ku ez westiya

bûm û bi ser de jî me depên li ser pencerên odê venekiribûn, gava em derketin roka ku bilind bûbû li ser cadê mîna sîlakê li rûyê min da. Marie ji kêfa dihat bifiriya, hema xwe çenk dikir û digot dunya xweş e dunya xweş e. Min xwe hinekî çêtir dît û bala xwe dayê

ku ez birçî bûm. Miri ew yek ji Marie re got lê wê çentê xwe yê cawê şirnakî<sup>11</sup> pêş min kir. Wê çekên me ên ji bo ketina avê û destmalek

xistibûn hundirê wî çen teyî û bi wê yekê xwest bigota ku wext ne wexta xwarinê bû. Ez bêçare bûm xwe ragirîn û me dengê

Raymond kir wî deriyê xwe li paş xwe digirt. wî şerwalekî şîn û gomlikekî spî bi zendikên kurt li xwe kiribû. wî kumekî ji qeselan jî xistibû serê xwe û kenê Marie bi wî hat. Bazendên destên wî spî û bi mûyên reş bûn û dilê min hinekî ji wan mûyan û wêpûsta spî li hev ket. Bi daketina xwe wî difikand û ew pir kêfxweş dixuya. wî ji min re got: "Merheba birako" Salut, vieux", û silav li Marie kir tenê got "Mademoiselle".

Roja çûyî, em çûbûn bal polîs û li wê derê min şahidî kiribû ku wê keça hanê Raymond "pîs" kiribû. Bi şahidiya min tişteke di situkura

Raymond de nema lêbelê hişdariyek jê re hat kirin ku careke din wî tişteke wilo nekira. Polîs li rasê û nerastiya gotinên min paşê

negeriya. Li ber derî, me bi Raymond re deng kir û paşê me biryar da ku em li otobûsê siwar bin. Perava deryayê ji me ne pir dûr bû lê bi otobûsê em ê zûtir bigihaştana. Raymond digot ku hevalê wî ê kêfxweş bibûya eger em wilo zû bigihaştana bal wî. Em li ser çûnê bûn dema Raymond ji nişka ve îşareteke da min û ji min xwest ku min li pêşiya xwe binerîya. Min birrek Ereba dîtî piştî xwe. dabûn pêşiya dukana pakêtfiroşiyê. Wan bi awê xwe wilo bêdeng li me dinerîn

weke ku em li ber çavên wan ne kêr ne zêde kevîrên bêniha an darên mîni bûn. Raymond ji min re got ku yê duduyan li ser destê

çepê mîrikê wî bû û diltengî li ser rûyê wî eşkere bû. Di serê wî de ew çîrok gerek tev bûbû û nizanîbû yê din li wê derê çî dikir. Marie xweş tê nedigihast û ji me pirsî çî mesele bû. Min jê re got ku ewan Ereba bela xwe difiroştin Raymond. Wê xwest ku em yekser ji wê derê dûr bikevin. Raymond di ci de xwe kenand, xwe rast kir û bi wî kenî got ku gerek bû me bilezanda.

Rawestegeha otobûsê ne pir dûr bû û me berê xwe da wê.

Raymond

ji min re got ku Ereba nedidan dî me. Min li paş xwe nêrî û dît ku ew ji ciyê xwe neliviyabûn û, bi eynî wê sersariya xwe, wan

li dera em jê çûbûn dinerîn. Em li otobûsê siwar bûn û Raymondê wê gavê bêhnfireh xuya dikir, henek dikirin û dixwest kenê Marie bianiya. Min bala xwe dayê ku kêfa wî jê re dihat, lêbelê Marie guh

lê nedikir û bi serê zimanê Xwe lê vedigerand. Car cama wê bi ken lê dinerî.

Em li dorbarjê Cezayirê peya bûn. Perava avjeniyê ji îstegeha  
otobûsê ne dûr e lê dîsa jî gerek me deşteke biçûk di wê navberê  
de  
bibiriya û paşê me xwe bi kaşê wê deştê re ber bi kêleka avê  
berda.  
Li ser rûyê wê erdê pir kevirên bi rengê zere hebûn û kulîlkine  
spî  
di bin wî asmanê şînî sayî de bêtir spî dikirin. Marie sebra xwe  
dianî  
çentê xwe yê ji cawê şimkirî bi hêz li kulîlkan dida û pelikên wan  
belawela dikir. Em di nav rêzên xaniyan re derbas bûn, xaniyine bi  
47  
perçînên kesk û spî pêçandî. Hin ji wan vîllayan tev balkonên xwe  
di nav darên gezê de winda bûbûn û hin jî di nav keviran de rût û  
tazî bûn. Hêna em negihaştibûn qiraxa wê deştê deiyayek aram û  
bêliv ji me re xuya bû. Li dûranî çiyayekî qelafetê serê xwe  
berdabû  
nav ava zelal û di xew re çûbû. Dengê hûr, dengê motorê  
kÇiyekê  
di nav bêdengiya wê hawîrdorê de li ber guhê me ket û piştî wî  
dengî li dûr ve, li ser rûyê wê ava şeweqdar, me keştiyek  
masîvaniyê  
dît. Ew keştî wîqasî hêdî hêdî diçû ku mirov bawer dikir ku ew ji  
ciyê  
xwe nediliviya. Mane çend sosinên tehtan dan hev. Beri ku me  
xwe di wî kaşî de berda xwarê û em ber bi deryayê daketana, me  
dît  
ku hingê li kêleka avê beri me çend melevan hebûn.

Hevalê Raymond di ku1bekî ji textan de li dawiya peravê dima. xanî pişta xwe dida tehtan, berê xwe dida deryayê û sitûnên wî ên texôoî di nav avê de bûn. Raymond em bi hev dan nasîn. Navê hevalê wî Masson bû. Ew mêrikekî têra xwe dirêj bû ûji navteng û navmilên xwe wek çiyakî bû. Jina wî kinikî girover û qenc bû bi zarava şêniyên Parîsê dipeyvî. wî di ci de ji me xwest em ciyên xwe xweş bikin û got ku masiyên ku di sibeha wê rojê de wî girtibûn ji bo me li ser agir bûn. Min jê re got ku min gelekî mala wî xweşik didît. wî li min vegerand ku wî hemû rojên şemî û yekşeman û rojên bêkariyê lê derbas dikir. wî gotina xwe ajot û got: "Bi kevaniya xwe re. Em baş li hev dikin". Kevaniya wî jî bi xwe wê gavê bi Marie re dikeniya û wilo jî ew belkî cara yekemîn bû di temenê min de ku ez fikirim bi rastî bibim xwedî jin û mal. Masson dixwest têteta avê, lê jina wî û Raymond ne dixwestin bihatana. Em her sê daketin û Marie xwe negirt yekser xwe avêt nav avê. Min û Masson me xwe hinekî giran kir. Ew hêdî dipeyvî û min bala xwe dayê ku xuyekî wî hebû çî digot wî piştî lê zêde dikir û digot: "Ez ê bêtir bêjim " bê ku bi rastî tiştek li naveroka hevoka xwe zêde bikira. Dema ew li ser Marie axifî wî got: "Ew dilbir e, ez ê bêtir bêjim ew dilerevîn e." Paşê min nema guh li vê yekê kir û xwest laşê xwe bida ber xweşiya germa wê rokê. Xîzê dest pê kiribû di bin nigên me de germ dibû. Dilê min pir hebû min xwe biavêta

nav avê lêbelê min xwe ragirt ta ew daxwazî xurtir bibûya û, gava min nema bi xwe karîbû, min ji Masson re got: "Em herinê?". Min xwe li ser serî berda binê avê. Masson bi bêhna fireh da nav avê, dest bi ajnê kir dema nigên wî nema gihaştin binê avê. wî li ser zik, bi hawê beqan, avjenî dikir lê diyar bû wî baş bi avê nizanîbû.

Avjeniya

wî wîqasî pox bû ku min ew li paş xwe hişt. Min xwe gihand Marie. Av sar bû û ez bi kêf bûm ku min ajnê dikir. Ez û Marie em baş dûr ketin û me bala xwe dayê ku livên me di nav avê de û kêfxweşiya

me jî wekhev bûn.

Dema em ji qiraxa avê baş dûr ketin, me ji xwe re bi lîstika depê li ser rûyê avê lîst. Min rûyê xwe ber bi asmanan ve dikir û wilo jî rokê

perdeyên tenik yên wê ava ku li ser rûyê min diket devê min dida alî. Me dît ku Masson ber bi peravê vedigeriya ta xwe di bin rokê de li ser xîzê dirêj bikira. Qelafetê wî ji wê dûraniyê ji me re wek çiyakî

xuya dikir. Marie xwest ku me bi hev re ajnê bikira. Ez ketim pişt wê û min destê xwe li newqa wê gerand. Wê bi hêza zendên xwe av qelaşt û min alîkariya wê kir nigên xwe li avê da. Dengê çelpeçelpa

nizim di sibeha wê rojê de da dû me ta ku min nema dikarîbû.

Wê gavê, min kemera Marieberda. Min bêhna xwe xweşik sitand û berda û bi melevaniyek nerm ez vegeyriyam. Li ser kenarê deryayê min xwe bi ser zik li kêleka Masson dirêj kir û min rûyê xwe xist nav xîzê. Min jê re got: "av xweş bû" û baweriya wî bi xwe jî wilo bû. Marie i>"iştî min bi bêhnikê ji nav avê derket û berê

xwe da me. Min xwe avêt ser piştê ta lê binerîya çawa nezîk dibû.  
Laşê wê ji ber ava derya têrxwê giş demûşî bû û wê porê xwe bi  
paş  
ve avêtibû. Wê kêleka xwe bi ya min ve kir û herdu germayan,  
germa  
laşê wê û germa rokê pencên xwe bi nermî avêtin ser çavên  
min.

Marie min hejand û ji min re got ku Masson vegeriyabû malê û  
ku wext wextê firavînê bû. E~ ji nêza ketibûm, û dema bû behsa  
xwarinê, ei di cî de rabûm ser xwe. Lêbelê wê gavê Marie ji min re  
49

got ku ji sibehê de min ew maç nekiribû. Ew yek rast bû li gel ku  
dilê min di wan maçan de hebû. Wê got: "Were di nav avê de".

Me

bazda û di nav pêlên biçûk ên pêşîn de xwe dirêj kir. i>"iştîçend  
gazan

di nav avê de wê laşê xwe bi laşê min zeliqand. Wê rahnên xwe  
li dora rahnên min birin û anîn û dilê min bijiya wê.

Li vegerê dengê Masson hat bang me dikir. Min got ku ez gelekî  
birçî bûm û wî di cî de ji jina xwe re got ku kêfa wî ji min re dihat.

Nan xweş bû û min para xwe ya masî kir çend gep û bi lez  
daqurtand.

Piştî masî goşt û petatên raqelanî hatin. Me gişa bêdeng dixwar.

Masson baş şerab bi ser xwe de dikir û bê rawestan piyala min  
dadigirt. Dema bû dora qehwê, min bala xwe dayê ku serê min  
hinekî

giran bûbû û min gelek cixare jî kişandin. Min û Masson û

Raymond me hersiyar biryar da ku em hemû meha tebaxê angoyê

havîna paşîn bi hev re li kêleka wê avê derbas bikin û tiştê li me biketa

her yekî ê para xwe bidaya. Marie ji nişka ve ji me re got: "Ma hayê we ji saetê heye çend e? Saet tenê yanzde û nîve". Em giş mat

man û Masson wê gavê got ku me gelekî zû firavîna xwe xwaribû, lêbelê ew yek tişteki xwezayî bû û kengî mirov xwe birçî dibîne ji xwe ew saet saeta firavînê ye. Ez nizanim çima lê kenê Marie bi wan

. gotinan hat. Ez bawer dikim wê têra xwe vexwaribû û serê wê xweş

bûbû. Masson ji min pirsî ka dilê min hebû ez bi wî re li ber peravê hinekî li ser xwe bigeriyama. "Piştî firavînê jina min herdem xwe dirêj

dike. Kêfa min bi xwe ji vî tiştî re nayê. Piştî firavînê gerek e ez li ser xwe bigerim. Ez herdem jê re dibêjim ku ji bo sihetê çêtir e mirov

piştî xwarina nîvro li ser xwe bigire. Lê ew bi kêfa xwe ye." Marie xwest bima û alîkariya Xanima Masson bikira firax bişušta. Parîsiya bejnkînik got ku ji bo wê yekê gerek wê berdaya mêran û wilo jî em hersê daketin.

Tirên rokê te digot yekser xwe bi ser xîza peravê de berdidan xwarê û şewqa wê li ser rûyê deryayê awir dibim, çavên mirovan kwîr fikir. Kesek li ser xîza peravê nemabû. Li hawîrdor û jora wê deştê dengê sênî û kevçiyên ji hemû xaniyên biçûk dihat. Erd wek SO

sêlek sincîrî bû û wexma jê derdiket bêhna mirovan diçikand. Di



destpêkê de, Raymond û Masson li ser tiştinan û li ser kesin an peyvîn

ku min bi xwe ew nas nedikirin. Paşê min rem kir ku wan ji mêj ve hevudu nas dikirin û ku demekê jî bi hev re di malekê de mabûn.

Em ber bi avê çûn û meda ser tixûbê xîz û avê û em meşîyan.

Car caran pêlek ji pêlên din mezintir dihat û pêlavên me ên ji caw şil dikir. Hayê min ji tişteki tunebû û roka ku li serê min î serqot dida

pencên xewê davêt ser çavên min.

Ez wilo çav li xew bûm gava Raymond tişteke ku xweş ne gihast guhê min ji Masson re got. Lê di wê kêlîkê de ez çav li du Ereban ketim. Ew li dawiya peravê bûn û hêna baş ji me dûr bûn. Ew herdu

Ereb bi çekên taybetî bûn ên karkerên ku agir di tenûr û fiman de dadidan û ew bi aliyê me de dihatin. Min li Raymond nêrî û wî ji min re got: "Ewe." Me meşa xwe berdomand. Masson nizanîbû wan çawa dabûn dû me û ta wê derê hatibûn. Min ji xwe re got ku hebû nebû wan bêguman dîtibûn ku em bi çentên avjeniyê li otobûsê

siwar bûbûn, lê min dengê xwe nekir û bersiva Masson neda.

Ereban li gel ku hêdî hêdî dimeşîyan ew baş nêzîk bûbûn. Me meşa xwe neguherand, lê Raymond got: "Eger hat û pevçûn çêbû, Masson tu here yê din, Ez bi xwe ji mêrikê xwe re dizanim.

Meursault,

eger yekî din hat, ji xwe ew ji te re ye." Min got: "baş e" û

Masson destên xwe xistin bêrîkên xwe. Xîza sincirî anuha li ber çavên

min sor dixuya. Bi gavine wekhev em nêzîkî Ereban dibûn û ew navbera hanê hin bi hin kêmbû. Dema çend gavine hindik di navbera me de man, Ereba rawestiyân. Min û Masson me payên xwe giran kirin û me xwe li paş hişt. Raymond seraser ber bi mêrikê xwe ve çû û xweş negihaşt min çî jê re got, lê yê din xwest bi serê xwe poşek lê bixista. Bi wê yekê jî Raymond dest pê kir lê xist û di cî de gazî Masson kir. Masson ber bi mêrikê xwe ve çû û bi hemû giraniya qelafetê xwe du mişt lê d~. Yê din bi ser dev çû xwarê û di nav avê de gevizî. Ew çend kêlîkaD wilo ma, peqpeqok ji devê wî derdiketin û li dora serê wî diteqiyân. Raymond di wê gavê de li yê xwe Si da û rûyê wî di nav xwînê de hişt. Wî berê xwe ber bi min ve kir û got: "Tu ê bibînî ez ê çî torê bi serê wî bikim". Min bi qîrînê lê vegerand: "Hayê te jê hebe kêr pê re heyd" lêbelê hîna min tamam nekiribû ku kêrê destê wî vekiribû û devê wî qelaştibû. Masson xwe bi p~ ve zer kir ta bi hawara Raymond biçûya, lê Ereba din rabibû ser xwe û xwe xistibû pişt xwediyê kêrê. Me ji ber kêrê n"ewênbû Xwe nêzîk bikira û herdu Ereban wilo jî bê ku çavên xwe ji çavên me derxistana hêdî hêdî paşûber vekişiyân û wan bi wê

kêrê navbera hanê firehtir dikirin. Dema ew têra xwe ji me dûrketin,  
eWan revî revî bazdan û di cî de ji ber çavên me ketin. Piştî windabûna  
wan em di bin germa rokê de bêliv man û Raymond hema bazûyê destê xwe bi destê din diguvaşt û dilopên xwînê ji wî bazûyî  
dihatin xwarê.

Masson di cî de got ku textorek rojên şemiyên dihat wê nêzîkahiye û Raymond xwest seraser biçûya bal wî. Her ku wî gotinek digot xwîna ji birîna devê wî dihat peqpeqok çêdikirin. Me bi milê wî gin û em bi lez û bez vejeriyên mala Masson. Li wê derê, Raymond got ku birînen wî ne dijwar bûn û wî dikaribû bi tenha xwe biçûya bal textor. Ew bi Masson re çû û ez bi herdu jinan re mam û min ji wan re got çî bûbû; Kevaniya Massoli digiriya û Marie ruh tê de nemabû. Ez bêçare bûm ji wan re wê çîroka hanê bêjim lê paşê min

nema dengê xwe kir. Min çixarak vexist û ji xwe re li deryayê nê. Nêzîkî saet yek û nîvê, Raymond û Masson vejeriyên. Paçek li destê Raymond girêdayî bû û perçak benda çespdar li kêleka devê wî bû. Textor jê re gotibû ku ne tiştêk bû, lêbelê Raymond dîsa gelekî

bi keder dixuya û rûyê wî hatibû ginin. Masson xwest qerf û henek pê re bikira, kenê wî baniya lê dîsa tu deng ji Raymond derneket.

Dema Raymond got ku ew ê ber bi peravê daketa, min jê pirsî ew ê bi kuderê biçûya. wî li min vejerand ku wî dixwest hinek ba ji ber serê xwe berda. Min û Masson me xwest ku em bi wî re

derketana lê wê gavê ew pir hêrs bû û gotinên ne xweş ji me re kir.

Masson got ku ya baş ew bû me dev jê biqeriya, me bihişta wî li gor

51.

dilê xwe bikira, lêbelê min dîsa jî da dû Raymond.

Em texnekî li ser peravê meşiyar. Rok aiiuha pir bi tîn bû û tîrêjên wê li ser xîzê û li ser rûyê deryayê dişikestî û belav dibûn. Pêşî min bawer kir ku Raymond dizanîbû bi kuderê diçû, lê paşê min xweş nas kir ku ev baweriya min ne di ciyê xwe de bû. Li dawîya peravê em dawîya dawî gihastin ber çavkaniyeke biçûk. Ava wê çavkaniyê

di nav xîzê re diherikî û li paş zinarekî mezin ber bi deryayê diçû. Me dît ku herdu Erebên me li wê derê bûn. Wan xwe bi çekên

xwe ên rûnavî li ser wê erdê dirêj kiribûn. Yê ku li wan bineriya ê bigota hayê wan ji bayê felekê tunebû û ew bêdeng û aram dixuyan

weke ku wan hinekî dilên xwe hênik kiribûn. Hatina me tiştêk ji tevgera wan neguherand û yê ku kêr li Raymond dabû bêdeng li Raymond nêrî. Yê din li zileke biçûk dixist û li me dinêri. wî tenê sê deng ji wê bilûrê derdixistin û bê ku çavên xwe biqurmiçandana, ew her sê dengên hanê hema vedigerandin.

Di wê demê gişî de, tiştên ji wê hawîrdorê man ew rok bû, ew bêdengî bû, ew dengê hûr yê çavkaniyê û ew her sê dengên bilûrê bûn. Raymond destê xwe dirêjî bêrika demançê kir lê yê din ne liviya

û wan wilo jî herdem li hev dinêrin. Min bala xwe dayê ku pêçiyên

nigên yê ku li bilûrê dixist pir ji hev dûr bûn. Raymond bê ku awirên xwe ji dijminê xwe bişkendanda ji min pirsî: "Ma tu çi dibêjî?"

Ez wî daxînirn?" Min bala xwe dayê ku eger min bigota na ew ê hêrs bûbûya û bêguman wî ê demançe berda wî. Min tenê jê re got: "wî hêna ji te re tiştêk negotiye. Ne xweş e hema tu wilo bi wî biteqînî." Dengê hûr yê avê û bilûrê di kezêba wê bédengiyê û wê germê de dîsa gihastin me. Paşê Raymond got: "Baş e, ez ê herim gotinên dijûnî jê re bidim û eger ew devê xwe veke, ez ê wî daxînim;"

Min lê vegerand: "ya rast eve. Lêbelê eger ew kêrê nekişîne, nabe tu demançe berdê." Raymond wê gavê hinekî germbû. Yê din

herdem li bilûrê dixist bi yê pêşîn re baş bala xwe dida tevgerên Raymond. "Na, min ji Raymond re got. Wek mêran herê û ka demançe

bide min. Eger yê din dengê xwe bike, an kêra xwe bikişîne,  
53

ji xwe ez ê wî daxînim."

Dema Raymond demança xwe da min, şewqa rokê di ser hesinê wê re şemitî û demançe biriqand. Lê em di ciyê xwe de bêliv man wek ku her tiştî dora me zeft kiribû. Bêyî ku yekî ji me awirên xwe bişikenda me li hev dinê û her tişt rawestiyabû, her tişt di nava deryayê, xîzê, rokê, herdu bédengiyan, bédengiya bilûrê û ya avê de

rawestiyabûn. Wê gavê min ji xwe re got ku du tişt li pêşiya me hebûn,

me dikaobû biteqanda an neteqanda. Lê ew herdu tişt bi rastî

wekhev bûn û mirov nikarîbû bigota ku yek ji ya. din çêtir bû. Ji nişka ve, herdu Ereban paşûber xwe vekişandin û xwe avêtin paş wî

zinao. Ez û Raymond jî wilo em li ser şopên xwe vejeriyan. wî hinekî

çêtir xuya dikir û behsa otobûsa vejerê kir.

Min ta xaniyê biçûk yê Masson da tengala wî. Ê ew bi pêlikên ji text hildikişiya gava ez li ber pelika pêşîn rawestiyam. Ji ber germa rojê zingînî ji ber guhê min dihat û min di xwe re nedît bi wan pelikan

hilkişim û dîsa jî çîrokê ji herdu jinan re bêjim. Lê germa wîqasî xurt bû ku min nikaobû jî li ser wê pelikê wilo bêliv di bin barana awirbirr de bimama. Wekhev bû ez li ser wê pelikê bimama an bi derine din biçûma. Piştî demekê, ez ber bi peravê vejeriyam.

Rok di zikê asmanan de asê bûbû û agirê jê dipijiqî dunya li ber çavên mirovan sor dikir. Bêhna pêlên biçûk ên avê diçikiya û deryayê

bi helkehelk ew pêl li ser piştta xwe dikirin û ew digihandin ser xîza peravê. Ez hêdî ber bi zinaran dimeşiyam û min bawer dikir ku eniya min ji ber germa XUrt ya rokê dinepixî û dihat belav bûbûya. Germayê dîsa hemû giraniya xwe berdida ser milên min û di rûyê min de dirawestiya. Her ku tîna wê germê li eniya min dixist, min çengoyên xwe bi ser hev de dişidandin, min germiştên xwe di bêokên

şelwarê xwe de didan hev û diguvaştin. Rokê serxweşiyek tîr berdida canê min û min hemû laşê xwe dişidand ta ku min wra wê ûwê serxweşiyê bibira. Her ku şûrek ronahiyê ji nav xîzê, ji qaçilekî

spî bûyî an ji perçek ŞJÎşeke şikestî dipijiqî, min çengoyên xwe  
didane

hev. Ez demeke baş dirêj meşiyam.

54

Ji dûranî qelafetê tarî yê tehta biçûk xuyanê kir. Şewqê û  
keldûmana

deryayê dibûn tozeke awirberr û xwe lê girtibûn. çavkaniya  
hênik li paş tehtê di bîra min de bû û min dixwest car din dengê  
xuşexUŞI ava wê bikira. Min dixwest ji ber tîne xwe bida alî û zor li  
xwe bikira giriyê wan herdu jinan ji bîr bikira, erê min dixwest sî û  
xweşiya ~ê çavkaniyê peyda bikira. Lê dema ez nêzîktir bûm, min  
dît ku mêrikê Raymond vegeriyabû û li wê derê bi tenha xwe bû.  
wî xwe li ser piştê dirêj kiribû, destên xwe xistibû paş hustwê xwe.  
Eniya wî di bin siya tehtê de bû û hemû laşê wî li ber germa rojê  
bû. Di nav wê germê de, keldûman ji çekên wî diçû. Ez hinekî  
veciniqîm.

Ji bo min bi xwe, ew çîroka hanê çîrokeke kevn bû, û bê ku  
ew di bîra min de bûya, ez ji xwe re hatibûm wê derê.

Hema ew çav li min ket, wî di cih de hinekî xwe rast kir û destê  
xwe rada bêrika xwe. Min jî helbet demança Raymond ya di bêrika  
çakête xwe de zêft kir. wî wê gavê dîsa xwe bi paş ve kişand lêbelê  
destê xwe ji' bêrika xwe dernexist. Em baş ji hev dûr bûm û hêna  
deh duwanzdeh gavên mezin di navbera me de hebûn. Car caran  
min dizanîbû ku wî di nav palikên çavên xwe ên nîvgirtî de li min  
mêze dikir, lê sûretê wî di nav bayê sincirî de bêtir li ber çavên min  
dilerziya. Dengê pêlên deryayê ji nîro û şûn de qelstir û tembeltir  
bû. Rok ew rok bû û şewqa li ser wê xîzê ew şewq bû . Ji du saetan

û şûn de, ew di asmanan de asê bûbû, ji du saetan wê mîna keştiyekê

lengerê xwe berdabû nava ava deryayek ji hesinê keliyayî. Li ser milê asoyê dûr keştiyê buxarî buhurî û min bala xwe dayê ku ji ber ku min herdem di bin çavan re li yê Ereb dinêrê herdem ew pitika

reş li ber çavên min bû.

Min ji xwe re got ku eger ez tenê nîv fitlê li dora xwe bizîviriyama, her tişt ê tev bûbûya. Lê ew perava sincirî ketibû paş min, wê min bi pêş ve dajot û wilo jî ez nezîvirîm. Min çend gav ber bi çavkaniyê

avêtin. Yê Ereb neliviya û bi rastî ew hêna têra xwe ji min . , dûr bû. Ez baş nizanim lê belkî ji ber siya tehta li ser rûyê wî dilîst min bawer kir ku ew dikeniya. Min xwe ragit. Rokê anuha dest pê 55

kiribû nîçikên min jî dişewitand û dilopên xwêdanê di nav bnîyên min de gihaştibûn hev. Roka wê rojê eynî roka roja vêşartina dayê bû û, wek wê rojê jî, eniya min bi taybetî dêşiya û hemû damarên min di bin pûsta bedena min de bi hev re lêdidan. Min nema ji ber şewatê kir der û ez ji ciyê xwe liviyam û bi pêş de çûm. Min dizanîbû

ku ew kerîtiyek ji min bû, min dizanîbû ku ez ê bi wê pêşveçûnê ji wî agirî xelas nebûma, lê min gavek, tenê gavek bi pêş avêt û bi wê gavê yê Ereb bê ku rabûya ser xwe kêra xwe kişand û ew di bin şewqa rokê de da ber nîyê min, Ronahî li ser pola kêrê pijiqî, bû wek devê kêrek awirbirr hema li eniya min dida. Di vê gavê de hemû

xwêdana di nav bnîyên min de ji nişkê ve bi ser çermokên çavên



min rijiya û mîna perdak şîrgermî û stûr li ber çavên min ma.

Min li paş wê perdeya xwê û hêsiran nema ber xwe didît. Nema hayê

min ji ru tiştî jî hebû, min tenê dizanîbû ku rokê bi sene û sêlên xwe ên sincirî eniya min dax dida û şûrê şewq dar yê ku ji kêrê dipijiqî

herdem li ber nîyê min bû. wî şûrê sorkirî mijankên min dikeritand û di çavên min ên dêşiyar de diçû xwarê. Di wê gavê de her tişt hejiya. Deryayê nefesek tîr û pir bi tîn bi xwe re anî. Ji min re wilo xuya bû ku asman bi hemû firehbûna xwe bûbû deriyekî vekirî

û di wî derî re baranek ji pêtên şewatê bi ser nîyê erdê dibariya. Hemû

canê min hate hev û min girnista destê xwe li dora destikê demançê

guvaşt. Dîkê demançê sist bû û destê min li wî zikê şayik ket. Bi wê yekê, bi wê qurpîna hem hişk û hem pir xurt, her tiştî dest pê kir. Min xwêdan û rok hejand. Min nas kir ku min tewazina rojê wêran û berbad kir. Min xwe li ser wê peravê bextewer dîtibû û, bi wê qurpînê, min nas kir ku min bêdengiya awarte ya wê peravêdirrand.

Wilo jî, min çar gullên din berdan wî laşê bêruh. Gulleyan bê ku xuya bikira di laş de diçûn xwarê. Ew her çar gulle wek çar carên kurt bûn ku min bi destê xwe li deriyê malwêraniyê dixist.

S6

Beşê Dudan

1

Piştî girtina min di cîh de çend caran tehqîq bi min re hatin çêkirin. Lêbelê pirsên ku ji min dihatin kirin pirsine li ser nasîna min bûn û wan jêpirsînan gelekî dirêj nekirin. Cara pêşî li polîsxaanê ji min re xuya dikir ku serhatiya min bala ul kesî nedikişand. Piştî heftiyekê ji

girtina min, dadmendê jêpirsîn û vekolînê bi tersî gişan bi awakî fizûlî

li min nêi. Lê dema wî dest bi jêpirsînê kir, wî jî pirsî nav û navnşîna min kir, pirsî ku min çî kar dikir, ez li kuderê û kengî çêbûbûm.

Paşê wî xwest bizanîba ka min ji xwe re parêzgerê helbijartibû. Min vegerand ku bi rastî min ew yek nekiribû û min pirsî ka bêyî wê yekê nedibû. wî pirsî: "çima?" û min vegerand ku serhatiya

min pir sade bû, parêzgerê jê re nedivat. Ew wê gavê di nav lêvên xwe de kenîya û wî got: "Ev yek dîtinek e, lêbelê qanûn qanûn e. Eger ul parêzgerê ji xwe re nebînî, em ê bêgav bibin li ser berpirsiyariya

xwe yekî ji te re peyda bikin." Min dît ku ew tiştêkî pir baş bû ku dadmendiyê ev kitekit û karûbarên hûrik davêt ser milê xwe û min ev yeka hanê jê re jî got. wî li min vegerand ku gotinên min di cîhê xwe de bûn û gihaşt wê netîcê ku qanûn bi zanebûn û dûröinî

hatibûn sazkin.

Di destpêkê de min rûmeteke wilo zêde neda tevgera wî. wî ez xistim odakê bi perdan rapêçan dî. wî ji min xwest ku ez li ser sendeliyek

bi destik rûniştama. Li ser nivîsgehê lempak hebû û wê lempê

.ronahiya xwe tenê bi ser serê min û sendeliyê xwar dikir.

Dadmendê

vekolînê bi xwe di nav tariya odê de bû. Min teswîrek weha

S7

di pirtûkan de xwendibû û hebûna me wilo di wê odê de ji min re  
mîna lîstikekê xuya bû. Lêbelê gava hevpeyvîna me tev bû, min  
dest

pê kir bi awakî cihê lê mêze kir, min dît ku ew mirovekî bi dem û  
lêvine lihevhatî bû. Ew bejindirêj bû û çavên wî ên şîn di kortên  
xwe de hinekî çûbûn xwarê. Mûyên spî di nav simbêlên wî ên dirêj  
de pir bûn û porê serê wî gij bû, tiştê jê re nemabû bi giştî spî  
bûbûya.

Min dadmend mirovekî gelekî aqilmend dît û li gel ku di rûyê  
wî de rehinan lêdidan û dora devê wî hinekî xwaromaro dikirin,  
bi kurtî, min ew qenc û dilsoj dît. Gava derketinê, min wextî destê  
xwe dirêjî destê wî bikira, lê Xwedê kir di wê gavê de hat bîra min  
ku min mirovek kuştibû û ew yek nedibû.

Li zindanê dotira rojê, parêzgerê ji bo min hat. Ew kinikî girover  
bû, hêna têra xwe gênc bû û wî porê xwe bi çermê serê xwe rastî  
şayik kiribû. Li gel ku dunya germ bû (ez bi xwe bi tena qemîs  
bûm) wî destek çakêt û şelwarê tarî bi ser qemîsekî bi gerdena  
guhikên

şikenandî li xwe kiribû û graletek seyr bi rêzine pehn reş û spî  
li qirika xwe girêdabû. çentê wî di bin çengê wî de bû û wî ew  
çente

danî ser textê min, xwe bi min da nas kirin û got ku wî dossiera  
min xwendibû. Doza min ne hêsan bû, lêbelê eger min pişta xwe  
bi

wî rast bikira û baweriya xwe bi wî bianiya, ji xwe şika  
biserneketinê

ji binê ve nediket dilê wî. Min ew sipas kir û wî ji min te got: "De  
ka em di cî de têkevin dilê dozê." .

Ew li ser text rûnişt û wî ji min re rohnak kir ku dadgehê di  
vekolîna

xwe de agahî li ser jiyana min ya kesane dabûn hev û wê dizanîbû  
ku diya min ne ji mêj ve li wargeha pîran miribû. Wilo jî li  
Marengoyê

bi xwe jî pirs li ser min hatibûn kirin. Bazpîrsên dadgehê  
têgihaştibûn ku çî ye ne çîye di roja veşartina dayê de "min  
nîşanên

sersarî û bêhîsiyê dabûn xuya kirin". Parêzgerê min got: "Bi rastî  
hinekî bi min ne xweş tê ku ez van tiştan ji te bixwazim. Lê ev pir  
gîrîng e. Eger ez nikaribim bersiva vê yekê bidim, ev yek ê di destê  
dadyarê dadgehê de bibe peyt û îsbateke mezin li dijî te." wî ji min  
xwest ku min alîkariya wî bikira û pîrsî ka wê rojê ez xemgîn bûm.

58

Vê pîrsê hişt ez ecêbmayî bimînim û ez bawer dikim ku eger min  
ew ji kesekî bikira min ê ji ber xwe şerm bikira. Lê min lê vegerand  
ku ji mêj ve min nema pirs li ser hîs û dilgermiyên xwe ji xwe dikir  
û loma jî min nikaribû tu agahî bigihandana wî û alîkariya wî bikira.  
Bi xwe ne ku min ji dayê hez nedikir, lêbelê mana wê hezkirinê  
tunebû.

Hemû kesên spîsax rojekê ji rojan di dilê xwe de pir an kêm  
mirina kesên li ber dilên xwe şîin dixwazin. Dema min ev gotinên  
hanê ji parêzger re gotin wî nema xwe girt, gotina min birrî û  
gelekî

bêhnteg xuya kir. wî hişt ez sozê bidim wî ku ez tiştên wilo roja daniştina dadgehê an li pêşiya dadmendê dadresiyê nebêjim. Lê min jê re rave kir ku xuyê min wilo bû, ku daxwazên laşê min rora hîsên min dibirin û dihiştin ku ew hîs piraniya caran tevlihev bibin. Roja veşartin~ dayê, ez pir westiyayî bûm û xewa min dihat. Ji ber wê yekê, min bîr nedibir çî li dora min dibû an nedibû. Tiştê ez jê serrast bûm ew bû ku min bêtir dixwest ku dayê nemira. Dilê parêzger

hênik nebû û ji min re got: "Ev yek ne beş e.»

Ew di ber Xwe de ramiya. Paşê wî ji min pirsî ka wî dikarîbû bigota ku wê rojê min zora hîsên xwe ên xwezayî biribû û ew eşkere nedikirin.

Min got: "Na, ji ber ku ev tişt ne rast e.» wî bi şêweyekî seyr li min mêze kir weke ku dilê wî hinekî ji min li hev biketa û, weke ku wî bi wê yekê dixwest hinekî min bêşanda, wî bi en girîn got ku min bixwesta nexwesta serdebîr û karmendên. mala pîran ê bihatana şahidiyê û "vê yekê dikarîbû tore bi serê min de bianiya." Min bala wî kişand ser wê yekê ku tu pêwendî di navbera vê çîrokê

û doza min de tunebûn, lê wî tenê li min vegerand ku eşkere bû ku tu carî berê karê min û dadgehan bi hev neketibû.

Parêzgerê min ji bal min bêteng rabû. Min bi rastî dixwest bi milê wî bigirta û jê re rave bikira ku min dixwest kêfa wî ji min re bihata, ne ta ku li ber dadgehê wî ez çêtir biparastama, lê hema wilo

ji ba Xwedê. Min dizanîbû ku min ew bêhteng fikir. Ew di min de nedigihast û wilo jî dilê wî hinekî ji min dima. Min dixwest jê re bipeyitanda ku ez wek herkesî, erê wek vê alemê gişî bûm; Lê bi

rasô ev tiştên hanê giş bê îede bûn û ji ber tembelî û sersariyê min tiştekan nekir.

Hinekî paşê, ez dîsa çûm ber destê dadmendê jêpîrsînê. Saet duduyê

pişti nîvro bû û perdên di nivîsgeha wî de nikaiîbûn di rûyê ronahiya xurrt de bimana. Hundirê odê gelekî germ bû. wî hişt ku ez rûnim û bi zimanekî şîrîn ji min re got ku parêzgerê min "Ji ber sedemekê ji nişka ve li ber wî peyda bûbû" nedikaribû bihata.

Lêbelê

mafen min hebû ku min bêyî wî bersivên pîrsên wî nedana.

Min got ku min dikarîbû bêyî parêzgerê xwe jî bersiv bidana. wî li ser masa ber xwe tiliya xwe danî ser bîzmîka zengilekî elektrîkî û bi wê yekê, tendnivîsekî (bayganekî) ciwan derbas bû û pir nêzîkî pişt

min rûnişt.

Me cîyên xwe di sendeliyên xwe ên bidestîk de xweş kir û jêpîrsînê dest pê kir. wî pêşî ji min re got ku dema dibû behsa min dihat gotin ku ez mirovekî bêdeng û dûrî civatê bûm û xwest bizanîba min çî digot. Min vegerand ku "Erê ji ber ku tiştekan min wilo balkêş tune ez bibêjim, loma ez dengê xwe nakim." Dadyar wek cara pêşî dîsa di ber xwe de keniya û got ku rast bû eger tiştekan mirov tunebe mirov bêje wê gavê ji bêdengiyê çêtir tune. wî gotina xwe ajot: "Leyse, ev tişt yeckar bê bêqîmet e." wî nema dengê xwe kir, li min nêri, pişt xwe rast kir û ji nişkê ve bi dilgermî ji min re got "Tiştê ku ji bo min bi qîmet e û bala min dikişîne tu yî". Ez xweş tenegehaştim wî çî dixwest bigota û min dengê xwe nekir. wî berdomand:

"Tiştine di tevgera te de hene hişê min wan nakişîne. Ez ji te bawer im ku tu ê alîkariya min bikî wan ji min re rave bikî". Min lê vegerand ku serhatiya min bi xwe gelekî sade bû. wî bi keftekeft xwest min jê re behsa wê roja hanê bikira. Min ew tiştên ku berê min jê re behs kiribû dîsa bi rêz kir: ez li ser Raymond, peravê, avjeniyê, car din li ser peravê, çavkaniya piçûk, li ser rokê û her pênc gullên demançê bi kurtebirri peyivîm. Her ku hevokek ji devê min derdiket wî digot: "Baş e, baş e". Dema ez gihaştim ser laşê li ser erdê ramidandî, wî dîsa serê xwe bi erêyî xwar kir û got "baş e". Ez 60 bi xwe ji dubarekirina vê çîrokê westiya bûm û min bawer kir ku di hemû temenê xwe de min tu can berê wek wê carê wîqasî dengê xwe nekiribû.

Dadmend demekê bêdeng ma, paşê rabû ser xwe û ji min re got ku wî dixwest alîkariya min bikira, ku min bala wî dikişand û ku bi alîkariya Xwedê, wî ê tiştêk ji bo min bikira. Lê pîr wî dixwest dîsa çend pirs bikirana û ji nişkê ve ji min pirsî ka min ji diya xwe hez dikir an na. Min vegerand: "Erê, wek vê alemê gişî". Tundnivîsê ku bi bêhna fireh û li dû hev li mekîna xwe ya nivisandinê dixist bi wê gotina min xwe şaşomaşo kir û tiliyên xwe bêguman li şestiyne çewet da. wî xwe hinekî winda kir û bêgav bû paşûber li nivîsa xwe vegeriya. Bêyî ku mentiqekî berbiçav di nav wan pirsan de ji binî ve

hebûya yê dadmend wê gavê ji min pirsî ka min ew her pênc  
gullên  
demançê li ser hev berdabûn an na. Ez ramiyam û min jê re xweş  
rave kir ku pêşî, min tenê gulleyek teqand û piştî wê bi çend  
saniyan,  
min her çar ên din berdan. wî pirsî: "çima tu di navbera gulla  
pêşîn û ya dudyan de mayî?" Bi wê pirsê, dîsa perava sorbûyî li ber  
çavên min xuya bû û dîsa wê roka sinûn li eniya min da. Min dengê  
xwe nekir û di wê bédengiyê de dadmend li bendî bersiva pirsê  
xwe di nava xwe de dicoşiya. E~ rûnişt û bi bêhtengî wî bi tiliyên  
xwe porê serê xwe li hev da. wî enîşkên xwe danî ser nivîsgeha  
xwe,  
xwe hinekî ber bi min ve xwar kir û bi şêweyekî seyrî xerîb ji min  
pirsî: "Çima? çima te ew gulle berdan laşekî bê ruh li ser axê  
ramidandî"  
Min wê gavê jî nizanîbû çawa bersiva wî bida û dadmend  
destên xwe di ser eniya xwe re bir û bi dengê ku ji ber  
bêhtengiyê  
tevlîhev bûbû got: "Çima? Gerek e tu ji min re bêjî. çima?" Min  
jî herdem dengê xwe nedikir.  
Paşê ew ji nişkê ve rabû ser xwe, bi gavine mezin wî berê xwe da  
dawiya nivîsgeha xwe û çavikek dolaba belgehan kişand. wî xaçek  
ji  
zîv derxist û laşê Îsayê bi mîxan daliqandî bilind kir û ber bi min  
vegeriya.  
wî bi dengê hinekî lerzdar û guhertî got: "Ma tu vî mirovê  
hanê nas dikî, tu dizanî ew kî ye?" Min lê vegerand: "Erê, hel-



bet". wi wê gavê ji kezebeke peritî ji min re got ku baweriya wî pir bi Xwedê dihat, ku li gor baweriya wî li ser 1Ûyê erdê mirov çiqasî gunehkar bûya, Xwedê dibuhurî û ew dixist ber dilovaniya xwe.

Lêbelê

ta Xwedê di gunehê de bibuhuriya, gerek mirov ji dilekî rast tobe bikira. Dilê mirovê tobedar gerek mîna dilê zarokekî ji gunehan

vala bûya ta hezkirina Xwedê xwe berda hundirê wî. wi hemû gewdê xwe bi ser masê de xwar kiribû û xaç hema di ser serê min re

dihejand. Bi rastî, min fêhm nedikir wî çî dixwest bigota ji ber ku berî

her tiştî, min germ bû û di wê nivîsgehê de mêşine mezin hebûn xwe li ser 1Ûyê min datanîn û paşê, wî ez hinekî ji xwe ditirsandim. Min di eynî wextê de dizanîbû ku ew tişteki ne di ciyê xwe de bû ji ber ku yê tawankar ez bûm, ne ew. Lê wî dîsa jî berdomand. Tiştê ku ez hinekî têgihastim, ew bû ku di nêrina wî de, di hemû pêhatin û îtirafa min de, tenê tişteki nediyar hebû û ew tişt jî ew bû çima min guHa duduyan di cî de li dû ya pêşîn bemedabû, çima min xwe ragirtibû. Ji bilî vê yekê, hemû tiştên din baş bûn, pir baş bûn, tenê wî ev nuqte fêhm nekir.

Min ê jê re bigota ku ew şaş bû hema ji ya xwe danediket çunki ev nuqta dawîn ne wîqasî giring bû. Lê ew rabû ser xwe, wî rê neda

min, hemû qelafetê xwe bi ser serê min xwar kir û ji bo cara dawîn,

bi kelecana û meraq ji min pirsî ka baweriya min bi Xwedê dihat.

Min got na û wî jî ew bi qebrek mezin li ciyê xwe rûnişt. wi ji

min re got ku ew tişt ne mumkin bû, ku baweriya herkesî, ta wan kesên ku 1Ûyên xwe ji Xwedê dûr dibirin jî, bi Xwedê dihat.

Baweriya

wî bi vê yekê wilo xurt dihat û eger biba û rojekê heyvanê şikê xwe berda dilê wî, ji xwe wê gavê tu mane ji jiyana wî ê nema. wi bi dengekî bilind ji min re got: " Ma tu dixwazî ku jiyana min bêmane

bibe?" Di baweriya min de ev ne karê min bû û min ew yek jê re got. Min hîna gotina xwe tev nekiribû gava min bala xwe dayê

ku wî di ser rûyê wê masê re dest pê kiribû Îsayê li ser xaçê ber bi rûyê min dianî û bi rengdêreke neaqilane bi bilindî digot: "Ez ji can û dil file me. Ez ji viyê hanê bexşîn û lêbuhuiinê ji bo gunehên te dixwazim. Ma çawa tu dikari bawer nekî ku ew ne ji bo te bû ew wilo êşiya?". Min bala xwe dayê ku wî di şûna "Hûnê" de ji min re digot "tu", lê ez hatibûm heta qirikê. Germa hundir hema diwartlr dibû. Wek hercara ku ez dixwazin ji yekî tev bibim, min ji dadyar re jî da xuyakirin ku tiştên wî digotin rast bûn. Ez wê gavê ecêbmayî mam ji ber ku wî bi serfirazî digot: "Te dît, te dît, te dît çawa baweriya

te bi wî tê û tê xwe bispêrî wî?" Wê carê jî helbet wek carên din min got na. Gava min got na, ew bêçare dîsa bi ser sendeliya xwe ya bidestik hat xwarê.

Dadmend pir westiyayî xuya dikir. wî bêhnikekê dengê xwe nema kir û di bêdengiya wê bêhnike de mekîna nivîsandinê ya tu carî ji dû hevpeyvînê neqetiyabû di wê navberê de da dû gotinên dawîn.

Paşê wî bi baldarî û bi hinek xemgînî li min mêze kir û bi dengekî

nizim di ber xwe de got: "Min tu carî dil wek dilê te wilo hişk nedîtine.

Tawankarên heta anuha hatine ber destên min herdem li ber vê wêneya renckêşiyê hêsirên wan bariyane." Min wextî lê vegeranda

û bigota ku ew digiryan ji ber ku tawankar bûn. U min ji xwe re got ku ez jî yekî wek wan bûm. Ez tawanbarek bûm lêbelê min fikir û nedikir min nikarîbû bi rastî xwe wilo bidîta. Dadmendê jêpirsînê

wê gavê rabû ser xwe weke ji min re bigota ku jêpirsîn tev dibû. wî bi eynî wê bêgaviyê tenê ji min pirsî ka ez poşman dibûm. Ez ramiyam û min got ku bi rastî pirs ne pirs a poşmanbûyîna bû lê bi awakî min dikarîbû bigota ez ji ber hinekî aciz bûm. Eşkere bû wî ji min lem nedikir. Wê rojê tiştan ji wilo pê ve dirêjtir nekirin. Piştî vê yekê, min gelek carên din dadmendê jêpirsînê dît lêbelê her carê parêzgerê min bi min re bû. Tiştên ji min dihatin xwestin tenê ew bû ku min çend pitik ji agahiyên ku berê min dabûn ronaktir

bikirana. An jî, carinan dadyar bi parêzgerê min re li ser tuhmên li ser min diketin dipeyvîn. U bi rastî di wan gavan de tu carî kesekî

guh li min nedikir. Hin bi hin rengdêra jêpirsînan hate guhertin û min bala xwe dayê ku yê dadyar nema guh li min fikir û di serê xwe de bi awakî bersiva doza min dabû û ew avêtibû ser refikan. wî

nema ji min re behsa Xwedê kir û min tu carên din ew di kelecana wê roja pêşîn de nedît. Dawiya dawîn jî danûstandinên me xweştir

û dilgermtir bûn. Carinan, tenê çend pirsên biçûk ji min dihatin  
kirin,  
hinek axiftin bi parêzgerê min re dibû lê bi rastî jêpirsîn ji mêj  
ve tev bûbû. Wek ku yê dadyar bi devê xwe digot, doza min dabû  
ser rêya xwe û ber bi dawiya xwe diçû. Carinan jî, dema axiftin  
diçû  
ser tiştên giştî, wan rê didane min û ez jî beşdarî axiftinê dibûm.  
Dawiya dawîn bêhna min hate ber min û kesekî nepak di wan  
saetan  
de bi min re tunebû. Her tişt wilo bi şêweyekî xwezayî û bi  
hêsanî dibuhurî, her tişt bi pîvan bû û her yekî bi giranî û bi  
zanebûn  
bi karê xwe radibû. Wî10 jî di nava min de hîsek neaqilane  
peyda bû ku "ez jî yek ji malê bûm". Jêpirsînînan yanzdeh meh  
kişandin  
û piştî wê demê giştî, ez hinekî ecêbmayî dimînim ku tenê  
tiştêkî di wan mehan de kêfa min dianî. Ew tişt jî ew bû dema  
dadmend  
bi min re dihat ber devê deri. wî bi henekî destê xwe li milê  
min dida û digot: "îro bes e, axayê Decalê dijî-Îsa." Piştî wan deqên  
xweş li ber devê deri, ez diketim nav destên cendirman.  
il  
Tiştine hene min tu carl nexwestiye behsa wan bikim. Dema ez  
ketim  
girtîxanê, min piştî çend rojan nas kir ku ez ê tu car nexwazim  
behsa wan bikim.  
Lêbelê hinekî derengtir, min nema qîmet ji wan tiştan re dît ta ku

ez behsa wan nekim. Di rojên pêşîn de, min bi rastî xwe mîna zindaniyekî nedidît û min xwe radigirt wek ku ez li bendî bûyerine nû bûma. Lê piştî serlêdana Marie ya yekemîn, tenê wê gavê her tiştî dest pê kir. Ji roja ku nama wê gihaşt destê min (Wê di nama xwe de digot ku mafe wê tune bû bihata serlêdana min ji ber ku em ne jin û mêrê hev bûn) ji wê rojê de, selûla min ji min re bû mal û min nas kir ku jiyana min liwê derê radiwestiya. Roja pêşîn dema ez hatim girtin, ez ketim odakê û di wê odê de berê çend girtî hebûn piraniya wan Ereb bûn. Gava ew çav li min ketin ew kenyan û paşê ji min pirs" in min çi kiribû ta ku ez hatibûm girtin. Min li wan vegerand ku min yekî Ereb kuştibû û bi wê yekê ew di ciyê xwe de sar man. Piştî demeke ne dirêj êvar ket û wan pêş min kirin min ê çawa berra xwe ya ji zilan ji bo razanê raxista. Mirov dikaribû seriyekî wê berrê hinekî li hev bipêçanda û ew ji xwe re bikira balgeh. Şevê gişî sîsik di ser rûyê min re çûn û hatin. Piştî çend rojan ez bi tenha xwe ketim selûlek din û di wê selûlê de textekî textînî ji bo razanê hebû.

Di wê oda biçûk de satilek ji bo destavê û leganek hesinî ji bo serçav şuştinê jî hebûn. Zindan li jora jorin ya bajêr bû û di paceyeke biçûk de min dikaribû derya bidîta. Rojekê min wilo destên xwe li

mîlên ser paçê guvaştibûn û min rûyê xwe ber bi rojê ve biribû  
gava  
pasebanek buhuri hundir û ji min re got ku hinin hatibûn  
serlêdana  
min. Min ji xwe re got hebe nebe ew Marie bû û bi rastî jî ew  
derket.  
Min berê xwe da ciyê hevdîtinê. Ez ketim dalanekê û piştê ez bi  
çend pelikan hilkişiyam û car din ketim dalanekê. Ez derbasî  
ewyanekê  
pir fireh bûm ronahiya wê ji pencereke pir mezin dihat. Du  
derabeyên hesinî mezin ew eywan bi dirêjayiya wê dikirin sê  
perçên  
ji hev cihê. Di navbera herdu dera beyan de deh duwanzdeh gavên  
mezin hebûn girtî Lî kesên dihatin dîtina wan ji hev dûr dixistin. Ez  
çav li Marie ketim û ew bi kirasê xwe yê xetxetî û rûyê xwe yê sorî  
qemiri li hember min bû. Li aliyê min neh deh girtî hebûn û  
piraniya  
wan Ereba bûn. Li aliyê din jî giş Ereba bûn û Marie ketibû navbera  
du jinan. Yek ji wan herdu jinan pîreke hûrik bû lêvên wê bi ser  
hev de guvaştî bûn û çekên rêş lê bûn. Ya din jineke têra xwe girsî  
dagirtî bû, ew servekirî bû û bi dengê pir bilind diaxifi û gelekî  
xwe tevdida. Ji ber wê navbera di nava herdu dera beyan de girtî û  
kesên ku dihatin serilêdana wan bêgav dibûn bi dengê pir bilind  
bi hev re deng bikin. Dema ez derbasî odê bûm, qîrinên bilind li  
bin guhên dîwarên mezin û tazî diketin û vedigeriyan û ronahiya  
xurt ya ji asmanan bi ser carnana re dibariya û di hundirê eywanê  
de  
çavên mirovan kwîr dikirin ez hinekî gêjomêjo bûm. Selûla min ji

wê derê bi gelekî bêdengtir û taiitir bû. Min zû bi zû der û dora xwe ji hev dernexist lê piştî çenk kêlîkan çavên min hînî wê deverê bûn û wê gavê hemû rûyên li hember min di ronahiya rojê de pir xweş hatin xuyakirin. Min bala xwe dayê ku li dawiya wê eywanê û di navbera herdu derabeyan de pasebanekî zindanê rûniştibû.

Piraniya

girtiyên ereb û kesên ji malbatên wan ên hatibûn serlêdana wan li ser qelavîzkan li hember hev rûniştibûn. Ew ên wilo rûniştibûn

nedikirin qîrîn û tevlî wê qerebalixa xurt, ew bi dengê pir nizim bi hev re dikirin kurtepist û ji hev rehm dikirin. Kurtepiştista wan dibû wek zummînekê û di bin qîrîna kesên şîpya de dibû wek zummîna

aleta awazbumê. Ez ber bi Macie diçûm dema van tiştan zû bala min kişandin. Macie xwe hingê bi derûpencerê ve leziqandibû û ta jê dihat dibişiri. Min ew pir xweşik dît lê min nizanîbû çawa ew

yek jê re bigota.

"Ha?", wê bi dengê pir bilind ji min pirsî. "Wek tu dibînî" - Tu baş î, tişteke ji te re ne lazim e? - Na, her tiştên min hene."

Me nema. dengê xwe kir û Macie dibişirî. Jina qelawî stûr berê xwe bi mêrê li kêleka min dikir û qîreqîra wê bû. Ew mêrikê hanê bêguman mêrê wê bû mêrikekî kej î dirêj û bi nêrînek saf û sade bû. Xuya bû wan ji mêj ve dest bi axiftinê kiribûn û jinikê bi dengê

ta Xwedê dabûyê xurt dikir qîrîn û berdomand: "Jeanne nexwest Wî li ba xwe bihêle. Mêrik digot: "Erê, erê". "Min jê re jî got ku

piştî ku tu bêyî berdan tu ê dîsa WÎ bibî ba xwe, lê wê nexwest WÎ bi

xwe bigire."

Macie jî ji aliyê xwe kir qîrîn û got ku silavên Raymond ji min re hebûn û min got: "Spas". Min got "Spas" lêbelê dengê min di nav. dengê cîranê min de windabû. wî cîranê dixwest bizanîbûya "Ka ew ne nexweş bû". Jina WÎ keniya û got: "Ew tu carî ji wilo baştir nebûye".

Mirovê li milê min yê çepê xortekî hûrik bi dest û ti1iyine nazik bû û WÎ dengê xwe nedikir. Min bala xwe da wê pîra hûrik li

66  
hember wî. Min dît ku wê jî dengê xwe nedikir û wilo jî wan herduyan

hema bi awakî kwîr li hev dinêrîn .. Min nikarîbû bala xwe xweş bida wan ji ber ku di wê navberê de Marie ji min re bi qîrîn got ku gerek min hêviya xwe nebirriya. Min lê dinêrî û got: "Erê". Min dixwest milê wê di bin kirasê wê de biguvaşta. Dilê min dibijiya

wî cawê nerm î tenik û min nizanîbû min ê ji derveyî wî kirasê heviya çiyê din. bikira. Ez bawer dikim ku Marie bi xwe jî dixwest ku min ê hêviya xwe ji wî kirasê ne birriya çûnki wê herdem bi ken li

min dinerî. Ew dikiya û tenê diranên wê ên dibiriqand û qermîçokên

biçûk ên dora çavên wê ji min re hatin xuya kirin. Wê dîsa kir qîrîn: "Tu ê derkevî û em ê hevdu bînin!" Min lê vegerand: "Ma tu bawer dikî?" Min ev yek jê pirsî bi rastî tenê ta ez bêdeng nemama.



Wê gavê wê bi lez û herdem bi dengê bilind got ku erê, ku ez ê serbest bihatama berdan û ku dîsa em ê têketana avê. U jinika li kêleka wê fikir qîrîn û ji mêrê li kêleka min re digot ku wê selikek li qelema dadgehê ji bo wî hiştibû. Wê her tiştên di selikê de bi nav kir û hijmart~ Gerek bû ku mêrê wê xweş binerîya ka tiştek ji selikê

ne kêmbû ji ber ku her tişt buha bûbûn. Cîranê min yê din û diya xwe bêdeng li hev dinêrîn. Kurtepiştî Erebên rûniştî di nav nigên me re berdewam fikir. Li derve, ronahiya rojê li ser pencera mezin te digotdinepixî û bi ser rûyên wan kesan de mîna şîraveke nû dirijîya.

Min xwe hinekî nerehet didît û dilê min hebû ez ji wê derê derketama.

Ez ji ber wê qerebalixa xurt dêşiyam lêbelê Marie li wê derê bû û hebûna wê bi min xweş bû. Ez nizanim çiqas wext di wê navê re bêtir buhurî. Marie herdem bi bişirîn ji min re behsa karê xwe kir. Kurtepiştî û qîrîn tevlihev dibûn. Di wê dera tevlihev de tenê warek, tenê giravek ji bo bêdengiyê mabû û ew jî li kêleka min

bû di nêrînên wî xortê hûrik û pîra diya wî de bû. Paşê hin bi hin pasebanan ew Ereb ji wê derê derxistin û bi derxistina mirovê pêşîn

re piraniya kesên li wê derê nema dengê xwe kirin. P'irejina hûrik xwe nêzîkî mîlên hesinî kir û di eynî gavê de, pasebanekî ji lawê wê re îşaretek da jê xwest ew rabûya. Xort got: "Bi xatirê te, dayê"  
Pîrê

destê xwe di nav du milan re dirêj kir û hêdîka demeke dirêj ew destê xwe livand.

Ew çû di eynî wê gavê de ku mirovekî kumê wî di destê wî de derbas dibû û diket şûna wê. Pasebanan zindaniyek derbas kirin û wan herdu mirovan bi germî, lê ji ber ku ew eywan aram û bêdeng bûbû ew bi dengekî nizim bi hev re axifin. Paşê bû dora ôranê min yê milê rastê. Ew jî gerek biçûya û jina wî weke ku hayê wê jê nebû

ku ew dengê bilind di wê aramiyê de nema giring bû wê bi qîrînê got: "Baş li xwe miqate be û bila hayê te ji te hebe ha." Paşê dora min hat. Marie bi lêv û destên xwe ji min re maç şandin. Berî ku ez bi giştî ji wê eywanê derketama, min li paş xwe nêrî. Marie di ciye xwe de bêliv mabû û eynî ew bişirîna mezin li ser rûyê wê bû.

Pir wext di wê navberê de derbas nebû dema wê ji min re nameyk şand û ji wê namê û vir de wan tiştên ku min nedixwest behsa wan bikim dest pê kirin. Lêbelê ez naxwazim tiştan di serê xwe de mezin bikim û bi rastî ev yek ji bo min ne zehmetir bû ku ji bo yekî din. Di destpêkê de dema ez hatim girtin, tiştê herî zehmet ji bo min ew bû ku fikir û daxwaziyên min hêna yên kesên azad bûn. Wek nimûne ez bêjim, dilê min dibijiya ku min xwe li ser peravê bidîta

û min berê xwe bida avê. Dema min di serê xwe de dengê pêlên pêşîn di bin hevêsa payên xwe de çêdikir, dema min didît çawa laşê min av diqelaşt, dema min didît çawa ez bi wê yekê kêfxweş dibûm,

ez ji nişkê ve pê dihesiyam çiqasî dîwarên zindana min nêzîkî hev bûbûn. Vê yeka hanê çend mehan dirêj kir lê paşê, fikir û tevgerên

min bûn yên hemû zindaniyan. Her roj ez di hewşê de li ser

xwe digeriyam û wilo jî ez li bendî wê saetê an li bendî saeta hatina

parêzgerê xwe dimam. Min dizanîbû çawa wextê xwe yê mayî pir baş dûzan bikira. Min gelek caran di serê xwe de ji xwe re got ku eger ez bêçare bibûma di qurmê darek hişk de bijiyama, û ji bilî mêzekirina li gula asmanê di ser serê xwe re tiştêkî din tunebûya, ez

ê hin bi hin hînî wê yekê bûbûma. Ez ê li hêviya firîna firendeyan di 68

ser serê xwe re bimama, ez ê li bendî ewrên ku tevlihev dibûn bimama

wek çawa wê demê, li wê derê, ez li hêviya girafatên seyr ên parêzgerê xwe dimam û wek ku çawa berê, di dunyak din de, min xwe ta roja şemiyê radigirt ta laşê Marie li ser sînga xwe biguvaşt. Wilo jî gava min bala xwe xweş didayê, ez ne di qurmê dareke miii de bûm. Kesin din hebûn rewşa wan ji ya min gelekî kambaXtir hebû.

Ew fikra hanê bi xwe ya dayê bû û wê gelek caran digot ku mirov dawiya dawîn hînî her tiştî dibe.

Ji bilî vê, rewşa min liwê derê kêm zêde wek berê bû. Mehên pêşîn

zehmet bûn lê min li ber xwe da û wê berxwedanê hişt ew derbasbibin.

Wek nimûne ez behs bikim, dilê IQin dibijiyaya jinekê û nebûna wê ez dêşandim. Ew tişt gelekî xwezayî bû ji ber ku ez xort bûm. Ez bi taybeê bi Marie tu carî nedifikirîm lê bi jinekê, bi jinan, bi hemû jinên ku min nas kiribûn û ez bi wan re razabûm ez difikirîm.

Wilo jî rûyên wan û dilxwaziyên min hundirê selûla min tije  
dikirin. Wan fikran bi regekî dihiştin ku ez xwe winda bikim lê bi  
rengê din, wan dihiştin ku wext derbas bibûya. Pasebanê serok  
di  
wextê belavkirina xwarinê bi garsonê aşxanê re derbas dibû selûlê  
û  
navbera me xweş bûbû. Rojekê wî ji ber xwe ve ji min re behsa  
pirsa  
jinan kir. Wî ji min re got ku dema girtiyan gazin dikirin wan berî  
hertişê gazin ji vê yekê dikirin ..Min jê re got ku ez jî wek wan  
bûm û ku di nêrîna min de, ev yek neheqiyek bû li me dibû. Wê  
gavê wî got: "Ma ne ji bo vê yekê bi xwe ku mirov dikevin zinda-  
,nan ta ku ji dunya jinan bêpar bibin." Min got: - çawa? Ji bo vê  
yekê? - Erê ji bo vê yekê. Ma ne azadî eve. Di zindanê de hûn ji  
jinan,  
ji azadiyê bêpar dibin." Min berê yekcar bîra vê yekê nebiribû.  
Min wilo jî heq dayê: "Rast e, ma ku ne ev be mana sezayê ê çi be?  
- Erê, tu tiştan rem dikî, yê din na. Lê dawiya dawîn ew hîn dibin  
xwe bi xwe dilê xwe hênik dikin." Paşê yê paseban çû.  
Derdê cixaran derdekî din bû. Dema ez ketim girôxanê,  
kemberbenda  
min, qeytanên solên min, grafata hustuya min û her tiştên di  
bêrîka min de, bi taybeê cixarên min, ji min hatin standin. Dema  
ez ketim selûla xwe, min doza cixarên xwe kir, lê ji min re hat  
gotin  
ku ew tişt qedexe bû. Rojên pêşîn bi min pir ror bûn û belkî ji ber  
kurmê cixarê jî ruh di min de nema. Min ji depê textê xwe yê  
razanê

tîjik radikirin û ew dimijandin. Rojê gişî ez dilverî bûm. Ziyana  
cixaran yekcar li tu kesî tunebû û min nizanîbû çima wan  
pasebanan  
ez bê cixare dihiştim. Piştî demekê, min nas kir ku ev yek jî perçek  
ji azar û renckirina girtiyan bû. Lê dema ez bi ser vê rastiyê ve  
bûm, min nema bêriya cixaran dikir û ev renckirina hanê nema ji  
bo  
min renckirin bû.  
Ji bilî van serêşan, ez ne wiqasî bêkêf bûm. Dîsa jî pirs ew bû min  
ê çawa wextê xwe bikuşt. Ji dema ez fer bûm çawa tiştan bi bîra  
xwe bînim, ez nema aciz bûm. Carinan min oda xwe dianî bîra xwe  
û di serê xwe de ji qorzîkekê dest pê dikir û dîsa ez vedigeriyam  
eynî  
ciyê xwe. Min dest pê dikir û her tiştên li ser rêya xwe bi nav dikir.  
Pêşî, min gera xwe zû tev dikir. Lê her ku min ji nû ve dest pê  
dikir, ez di gera xwe de demek dirêjtir dimam. Min hemû  
esbabxanên  
odê dianîn bîra xwe û di her esbabxaneyê de her tiştên di hundirê  
wê de, û ji her tiştê di hundirê wan de hemû kitekitên wan û ji  
bo kitekitên wan jî nîşan ek li ser, derzek biçûk, û kêlekek hinekî  
birînbûyî,  
rengên wan an jî celeb û texlîtên wan min dianîn bîra xwe.  
Di eynî wextê de, min nedixwest rêya xwe di nava tiştan de şaş  
bikira,  
ne tiştekek ji bîr bikira. Piştî girtina min bi çend hefteyan, min dikarî  
qeyametek wexta xwe tenê bi hejmartina tiştên di oda xwe de  
derbas bikira. Wîlo jî her ku ez li ser tiştan hûr dibûm wiqasî jî  
tiştên

ku berê nedihatin bîra min an ji bîra min çûbûn vedigeriyan û  
ciyên xwe di serê min de çêdikirin. Min wê gavê nas kir ku mirovê  
ku tenê rojekê li ser rûyê erdê mabe dikare, bê zehmetî, sed salî di  
zindanê de bimîne û bîranînên wê roja hanê wê têra wî bikin ta ku  
ew di zindana xwe de aciz nebe. Bi awakî, ev tişt ji bo min tişteki  
nexerab bû.

Ji bo kuştina wextê xew jî hebû. Di destpêkê de, bi şev ez pir  
kêm û pîs radizam û bi rojê bi xwe xew ji binî ve bi çavên min  
nedibû.

Hin bi hin şevên min baştir bûn û ez bi rojê jî razam. Ez dikarim  
bêjim ku di mehên dawîn de ez di rojê de ji şanzdeh ta hîjdeh  
saetan radizam. Min ew her şeş saetên mayî bi xwarinê, bi çûna  
destavê, bi bîranînên xwe û bi çîroka mirovê çekoslovakî dikuştin.

Di navbera doşeka xwe ya ji pûş û depê textê razanê de, min bi  
rastî perçakî kevnî zerbûyî û pir tenik ji rojnamekê dîtibû û ew bi  
cawê doşekê ve hatibû leziqandin. Wê kaxeza rojnamê behsa  
biserhatinekê

dikir. Destpêka çîrokê kêm bû lê bêguman ew çîrok li  
çekoslovakayê

qewimî bû. Mêrikekî ji gundekî çekî bar kiribû çûbû ji  
xwe re li malê dunyayê bigeriya. Piştî bîst û pênc salan ew  
dewlemend

bûbû û bi jina xwe û zarokêkî xwe re vegeriya bû wî gundê  
xwe. Ta bihiştta ku dê û xuşka wî lê behetî bimana, wî jina xwe û  
lawê xwe li oteleke din hişt û bi تنها xwe vegeriya malê. Diya wî  
ew nas nekir û wilo jî wî bi henekan odak xwest û perene pir nîşanî  
dê û xuşka xwe kir. Di şevê de, dê û xuşka wî ji bo dizîya peran  
ketibûn

ser wî û ew bi çakûçan kuştibûn û laşê wî avêtibûn çem. Dotira rojê, jina wî hatibû û, bê ku bizanîbûya çi bi serê mêrê wê hatibû, wê ji dê û xuşka wî re rastiya wî rêwiyî gotibû. Dayê xwe daliqandibû

û xuşkê xwe bi saxî avêtibû binê bîrê. Min eV çîroka hanê ez dikarim bêjim bikêmanî hezar carî xwend. Ji aliyekî ve, ew çîrokek

dûîî aqilan bû û ji aliyekî din ve jî, ew gelekî xwezayî û sade bû. Di dîtina min de ew mirina hanê hinekî di heqê wî rêwiyî de bû. Di baweriya min de jî mirov gerek tu carî wilo henekên xwe neke. Wi10 jî, bi saetên xewê, bi bîranîna tiştan, bi xwendina çîroka xwe û bi guhertina şev û rojê wext derbas bû. Min li derekê xwendibû ku di zindanê de mirov dawîya dawîn ji bîr dike wext çawa derbas dibe lê ev yeka hanê ji bo min tişteki bêrûmet bû. Min berê bala xwe nedabûyê roj çiqasî dikaiîbûn di eynî wextê de dirêj û kin bûna.

Roj bêgwnan di jiyaneke de dirêj bûn, lê ew roj wilo vedizeliyan, diketin hundirê hev û di dawîya dawîn de tevlihev dibûn. Nav ji wan rojan re nediman, tenê peyvên "do" û "sibeh" hêna mana wan hebû.

Rojekê gava pasebanekî ji min re got ku pênc mehên min li wê derê çêbûbûn min jê bawer kir, lê min rem nekir çi dixwest bigota. Di selûla min de, ji bo min, roj herdem rojek bû û wê rojê bê rawestan

pêlên xwe ber bi min dajotin û tiştên ji min dihatin xwestin berdewam dikirin. Wê roja hanê, piştî çûyîna negehban, min di sêniya

hesinî ya ku min tê de xwarin dixwar li xwe nêrî. Min bala xwe

dayê ku li gel ku min dixwest bi sûretê xwe re bikeniyama rûyê  
min herdem cidî dima. Min sûretê xwe li ber xwe hejand û xwe  
kenand

lê wî sûreê dev ji wî mirûzê hişk û xemgîn berneda. Roj ber  
bi dawiya xwe diçû û saet ew saeta hanê bû, ew saeta ku ez  
naxwazim

behsa wê bikim, ew saeta bê nav, ew saeta ku dengên êvarê ji  
hemû qatan didan nav karwana bêdengiyê û zîz ber bi min ve  
heldikişyan.

Min xwe nêzîl4 pacê kir û di ronahiya dawîn ya rojê de  
dîsa li sûretê xwe mêze kir. Ew herdem wilo cidî bû, lê çima ew ê  
ne wilo bûya ji ber ku ez bi xwe wê gavê wilo cidî bûm? Di eynî wê  
wextê de û ji bo cara yekemîn piştî wan mehên girtîxanê, dengê  
min xweş li ber guhê min peyda bû. Min ew dengê hanê di wan  
rojên

hanê de ji mêj ve dibihîst û min nas kir ku di dirêjiya wan mehan  
de, ez bi xwe re, bi tenha xwe peyivîbûm. Wê gavê tiştê  
nexweşnêrê

di roja veşartina dayê de gotibû hat bîra min. Na, tu çareser  
tunebûn û kesek nikare bawer bike an bîne ser ziman êvarên  
girôxanan çi dijwar in.

III

Ez dikarim bêjim ku bi rasê havînê pir zû ciyê havînê girt. Min  
dizanîbû

ku bi hatina rojên pêşîn ên germê tiştêkî nû ê ji bo min  
biqewimiya.

Doza min di rûniştina dawîn ya dadgeha sezayê de hatibû



qeyd kirin û ev rûniştina hanê di havîna pêşin de tev dibû.

Dadgehê

di qiçîna germê de dest pê kir. Parêzgerê min dilê min xistibû  
cî û gotibû ku doza min eger pir dirêj bikira wê du an sê rojan  
bikişanda.

wî berdomandibû: "Dadgeh bi xwe ê bi lez di ser doza te re  
here ji ber ku di nava serhatên rûniştinê de ne dozeke wilo balkêş  
e.

Piştî te seraser doza bavkuj ekî ê dest pê bike."

Heft û nîvê destê sibehê, cendirme hatin dû min û trumbêla  
dorgirtî

ez ajotim ber devê seraya dadiyê. Herdu cendirman ez derbasî  
hundirê odake girtî kirim. Em li kêkela deriyekî rûniştin û me xwe  
ragirt. Ji paş wî deriya hanê mirovan bang hev qikilin û dengên  
wan tev dengê sendeliyan û xirecîreke mezin dibûn. Wan dangan  
û

wê xirecîrê cejnên tarê anîn bîra min dema konser teva dibûn û  
mirovan

ji bo dîlanê sendelî didan alî û ew navber vala dikirin. Herdu  
cendirman ji min re gotin ku gerek bû me xwe li hêviya dadgehê  
ragirta. Yekî ji wan cixarak dirêjî min kir lê min ew cixare ji destê  
wî

negirt. Paştî demeke kurt, wî cendirrî ji min pirsî "ka ez dilbitirs  
bûm". Min got na. Ez neditirsiyam û bi ser de jî, min bi rastî  
dixwest

bidîta dadgeh çawa bû. Di hemû temenê min de keyseke wilo  
neketibû min û min ew yek ji yê cendirme re rave kir. Cendirmê  
duduyan li min vegehand: "Rast e, lêbelê dawî mirov jê diweste."

Piştî bêhnikêkê bû çire çira zin gelekî biçûk di hundirê eywanê de. Wê gavê cendirman destbend ji destên min derxistin. Wan derî ji min re vekirin û ez derbasî qefesa rawanbariyê kirim. Hingî kesên pir hatibûn rê û rêwanî di eywana dadgehê de nemabû. Li gel ku la~ên penceran bi ser wan de kirîbûn, tîrêjên rokê di derinan re derbas dibûn û germa hundir bêhna mirovan diçikand. Camên penceran girtî mabûn. Ez rûniştim û herdu cendir~an yek li vî milî yek li milê din dora min girtin. Di wê gavê de ez li ber xwe çav li rêzek rûyê mirovan ketim. Wan rûyan hemûyan li min dinêrîn û min wilo jî nas kirku ew kesên sondxwar bûn. Ez nikarim bibêjim çi di wan hemu rûyan de wek hev bû an ji hev cihê bû lê hebûna wan wilo li ber min tenê hîsek di serê min de çêkir: Min xwe wek di tramwayê de dît û li hember min, li ser textê pêşiya min ew rêwiyên nenas rûniştîbûn û li bendî hilkişîna rêwîne nû bûn ta ku wan kesên kenawe ji nav wan derxistana. Ez xweş dizanim ku ew fikra hanê neaqilane û gelekî tewş bû ji ber ku bêşik eger ew li wê dadigehê li 73 tiştêkî digeriyan ew li tawankaran digeriyan. Lêbelê ferqeke bi rastî wilo mezin di navbera kenaweran û tawankaran nineye, û ez xweş nizanim çima lê ev fikra hanê di serê min de çêbû. Min ji ber pirbûna mirovan di wê eywana girô de hinekî xwe gêj kiribû. Min dîsa çavên xwe gerand û di nav wan hemû kesan de tu rûyî bala min nekişand. Ez bawer dikim ku di destpêkê de min rem

nekir ku ew merov giş tenê ji bo dîtina min hatibûn û ew dera hanê wilo dagirtibûn. Min rem nedikir ji ber ku bi rastî kesekî guh li min û li kesê min nedikir û min nizanîbû çawa bawer bikira ku serê wê qiyametê gişê ez bûm. Min ji yê cendirme re got: "Çiqas xelk hatind"

wi li min vegerand ku ew yek ji ber rojnameyan bû û wî bi gotina xwe re birrek kes nîşanî min da li dora masakê li jêra rêza sondxwaran bûn. wi ji min re got: "Wan e! Ji xwe re li wan biner!" Min pirsî: " Kî?" û wî dîsa got: "Rojname." wi yek ji nav wan rojnamevanan nas dikir û wî rojnamevanî wê gavê li me nên û berê xwe da me. Ew mirovekî baş bi temenê xwe mezin bû, dilsoj û bi rûyekî hinekî naxoş bû. wî bi dilgermiyek mezin destê cendirme di nav destê xwe de guvaşt. Min wê gavê bala xwe dayê ku hemû kesên li wê navê pêrgî hev dihatin, bang hev dikirin, bi hev re diaxirin, weke ku ew giş endamên klubekê bûna û her yekî ji nav wan xwe bi kesên wek xwe, ji çîna xwe kêfxweş didît. Min nas kir çima ez pê dihesiyam ku ciyê min di nav wan de tunebû û min nas kir çima li wê derê ez hinekî wek mirovekî bi wra xwe derbasbûma bûm. Lêbelê yê rojnamevan aisa jî bi bişîîîn bi min re peyivî û got ku wî hêvî dikir ku her tiştê baş ji bo min derbas bûbûya. Min ew sipas kir û wî gotina xwe berdomand: "Tu dizanî, me hinekî deng ji serhatiya te re

çêkir. Di havînê de bazara rojnaman dişikê. Bi ser de jî di nav hemû dozan de tenê ya te û ya mirovê bavkuj hêja bûn tiştêkî." wî paşê di nav koma ew jê derketibû mirovek nîşanî min da. Ew mirovekî kinik bû, wek mişkekî xûrma, rasûyekî ku tu bikî dermale wilo qutî dagirê bû. Berçavokine pir mezin bi hawîrdorine reş li ber çavên wî bûn. Min nas kir ku ew şandeyê taybetî yê rojnameke ji Pairsê bû

74

"Ew bi xwe ne ji bo te hatiye. Lê ji ber ku ew ê li ser doza yê bavê xwe kuştîye seretayê binivîse, me jê xwest ew di eynî wextê de doza

te jî bi telegraîe bişîne Parisê." Wê gavê jî min kir jê re bigota spas lê min ji xwe re got ku bi wê yekê min ê kenê mirovan bi xwe baniya.

wî bi destê xwe bi dilsojîşareteke da min û dev ji me berda.

Me dîsa çend deqên din xwe ragirt.

Parêzgerê min bi kirasê xwe yê parêzgeriyê bi komê hev!carên xwe re derbasî hundir bû. wî berê xwe da rojnamevanan, destê xwe

da wan. Wan bi hev re henekên xwe kirin, bi hev re kenîyan û ji min re xuya bû ku kêfa wan hemûyan li ô bû. Ew wilo bi hev re man ta ku di hundirê eywana dadgehê de zingilekî lêda. Wê gavê her kes vegehiya ciyê xwe. Parêzgerê min berê xwe da min û destê xwe da min. wî ji min xwest ku min bi kurtî bersivên pirsan bida û ku min ji ber xwe tişt zêde nekira. Ji bo tiştên din wî ji min xwest ku min piştî xwe bi wî xurt bikira.

Li milê min î çepê, dengê sendeliyek ku bi paş dihat kişandin hat û min mirovekî dirêjî bejinzirav dît, wî kirasekî sor li xwe kiribû û tenê bi berçavokeye yekçavî bû. Gava min nêrî, min dît ku wî ew

sendelî dikişand, rûdinişt û kirasê xwe bi haydari xweşik dipêçand  
ta

qermîçek tê de çênebûna. Ew mirovê hanê dadyar bû. Dergevanê  
dadgehê dengê xwe wê gavê bilind kir û got: "Dadgeh" û di eynî  
wextê de gurrînî bi du bawêşinkên mezin di zikê eywanê de ket.  
Sê

. dadmend, dudo bi kirasên reş û yek bi kirasê sor derbasî hundir  
bûn. Dossierên wan di destên wan de, wan bi lez berê xwe dan  
maseya

dirêj ya di dera herî bilind di eywanê de. Yê kirassor di nava  
herduyên din de li ser sendeliya bi destik rûnişt, kumê xwe yê  
dadmendiyê

danî ber xwe, xwêdana qehîe serê xwe yê guruz bi destmalekê  
zuha kir û bi lêv kir ku dadgehê dest bi daniştina xwe dikir.

Rojnamevanan hingê pênişên xwe amade kiribûn. Li ser rûyê  
wan hemûyan mirûzekî xwînsar û tenazawer dixuya. Di nav wan  
de

rojnamevanekî bi temenê xwe ji wan gişan bi gelekî ciwantir hebû,  
ciline nermik ji fanêlê cûn lê bûn, grafêteke şîn di hustuwê wî de  
75

bû. wî rojnamevanî tenê pênişa xwe li ser masa ber xwe hiştibû û  
hema li min mêze dikir. Rûyê wî ne wilo pir lihevhatî bû tenê  
çavên

wî bala min kişandin. Ew çavine gelekî zelal bûn û bêyî ku min  
bizanîbûya

wan çî dixwestin, wan bi baldari li min hûr dibûn. Wê gavê  
jî ez nizanim çawa lê sêrtek di serê min de çêbû û min bawer kir  
ku di neynikekê de min li xwe dinêrî. Bêguman ji ber vê yekê û ji

ber ku min xweş adet û tevgera wê deverê nas nedikir min baş  
fêhm  
nekir ne ji helbijartina sondxwaran, ne ji pirsên ku sermiyanê  
dadgehê  
ji parêzger, ji dadyar û ji sondxwaran kirin (bi her pirsê serê  
hemû sondxwaran bi hev re ber bi dadmendan diçû) ne ji  
xwendina  
bi lez ya nama suckariyê tevî ku.tê de min navên hin deran û hin  
kesan nas kirin û ne jî ji wan pirsên nû ên ji parêzgerê min hatin  
kirin.  
Min pir ji wan tiştan fêhm nekiribû û sermiyanê dadgehê got ku wî  
ê dest pê bikira yeko yeko bang şahidan bikira. Yê dergevan  
navine  
xwendin û wan navan bala min kişandin. Dema ez derbasbûm wê  
derê, tu rûyî bala min nekişandibû. Lê bi xwendina navan anuha  
ew  
yeko yeko li ber çavên min xuya dibûn. Serde bîr , dergevanê mala  
pîran, Thomas Pêrezê kal, Raymond, Masson, Salamano, Marie  
hemû  
bi xwendina navên xwe rabûn ser xwe, di deriyekî di kêlekê re  
derketin û ji ber çavan winda bûn. Tenê Marie ji nav wan bi dilekî  
tirsdar îşareteke da min. Ez hîna wilo ecêbmayî bûm çawa berê ez  
çav li wan neketibûm gava Cêleste jî, ango şahidê dawîn, bi  
xwendina  
navê xwe re rabû ser xwe. Min dît ku li kêleka wî ew jinika hûrik  
ya ku li xwaringehê bi wî re kar dikir rûniştî bû. Ew bi çakêtê  
xwe û wan tevgerên xwe ên jixwerazî li wê derê bû û bi kwîrayî li  
min mêze dikir. Lê wextê min çênebû bifikirim ji ber ku serokê

dadgehê dest bi axiftinê kir. wî got ku debatên bi rastî ê dest pê  
bikirina

û ji xwe ne girîng bû wî bala gelên wê eywanê bikişanda ku  
gerek ew li ciyê xwe bêdeng û aram bimana. Li gor gotina wî, ew li  
wê derê bû ta debat bi rastxwazî li ser dozekê çêbibûna û paşê jî  
ta

ku biryarnameya sondxwaran bi dadwerî di derheqa wê dozekê de  
bihata standin. Eger hinina ne di wê çarçovê de dengê xwe  
bikirana

û karê dadmendiye tevlihev bikirana, ji xwe wî ê ew eywan vala  
bikira.

Germa hundir xurtir dibû û min bala xwe dayê ku kesên hatibûn  
temaşekirinê rojnamên di destên xwe de ji xwe re dikirin  
bawesînk

û dengê. nizim yê wan kaxezên qermeçandî qut nedibû. Sermiyanê  
dadgehê destê xwe ji dergeven re bilind kir û wî yê hanê bi wê  
îşaretê

rahişt sê bawesînkên ji qeselên hûnayî û ew li dadmendan ge-  
. rand. Her dadmendî seraser ew bawesînk bi kar anî û ba li xwe  
kir.

Jêpîrsîna min wê gavê seraser dest pê kir. Sermiyan bi bêhnferêhî,  
ez dikarim bêjim jî bi hinek dilsojî, pîrsên xwe ji min kir. wî jî ji  
min xwest min nav û navnîşana xwe bigota û li gel ku ez bi wê  
yekê

bêhnteng dibûm, min ji xwe re got ku bi rastî kirina wan pîrsan  
tiştêkî

giring û xweza bû, ji ber ku ew ê tiştêkî pîr kambax bûya eger

mirovêk di şûna yekî din de bihata hukum kirin. Paşê dîsa sermiyan dest bi çîroka min kir. wî ew xwend û her sê hevokan berê xwe bi min ve kir û pirsî: "Ma ne wilo ye?" Min jî her carê, wek ku parêzgerê min min hîn kiribû vegerand û got: "Erê, axayê Serok". Wê yekê gelekî dirêj kir ji ber ku sermiyanê dadgehê li ser her kitekitên doza min gelekî hûr dibû. Di wê wextê gişî de, rojnamevanan hema dinivîsandin. Min dizanîbû ku ew rojnamevanê heri ciwan û wê jina hûrik ya xwe mîna jineke hesinî tevdida, awirên xwe ji min nedibirtin. Kesên li ser dîwançeya tramwayê rûniştibûn gişan li sermiyan dinêrîn. Sermiyan kuxiya, belgehên nava dossiera li ber xwe li hev dan, bawêşînkî xwe hejand û berê xwe ~i min ve kir. wî got ku gerek bû ku wî pirsine ji min bikirana, pirsine erê xuya dikirin ji doza min dûr bûn lê belkî pêwendiyine bingehîn di navbera wan de hebûn. Min wê gavê nas kir ku wî ê dîsa behsa dayê bikira û di cî de min nas kir ez çiqasî bi wê yekê aciz dibûn. wî pirsî çima min diya xwe xistibû mala pîran. Min vegerand ku min ew yek kiribû ji ber ku perê min têrê nedikirin min ji bo wê kesek bigirta li ber bima. wî pirsî ka ez di hinava xwe de dêşiyam çima min diya

77

xwe xistibû mala pîran. Min vegerand ku ne dayê ne min me nema



hêviya tiştêkî ne ji hev û ne ji kesekî din dikir, ku dawî jî her yek ji me wilo hînî jiyana xwe ya nû bûbû. Sermiyan wê gavê got ku wî nedixwest dirêjtir bikira û ji dadyar pirsî ka wî dixwest pirsine bikirana.

Dadyar berê xwe bi awakî eşkere nedida min, wî tenê nîvê piştî xwe bi min ve kiribû. Wî bi lêv kir ku eger sermiyanê dadgehê destûr

bida, wî dixwest bizanîba ka ez bi niyeta kuştina mêrikê Ereb bi tenha xwe zivirîbûm ber çavkaniyê. Min vegerand û got "Na". "Na xwe çima ew bi demancê dîsa vegeriyabû eynî wê dera hanê?"

Min

got ku ew tişt bi tesaduf! çêbû. Dadyar wê gavê bi zardeveke pîs û nexweş got: "Ez naxwazim anuha tu pirsên din bikim". Paşê tişt hinekî

tevlihev bûn, bi kêmanî wan wilo ji bo min xuya kirin. Lê piştî ku sermiyan bi yên din re çend caran kir kurtepist û li nêrînan guhdari

kir, wî bi lêv kir ku dadgeh radibû û piştî nîvrojê ê dîsa vebûya li şahidan guhdarî bikira.

Wextê min û ramandinê çênebû ji ber ku cendirman bi çeplên min girtin, ez siwaii trumbêla dorgirtî kirim û vegezan dim girtîxanê.

Min nanê xwe xwar û piştî wî nanî bi demekê erê wilo pir hindik bû lê dîsa jî min tê de nas kir ku ez westiyayî bûm, cendirme car din hatin dû min û her tiştî wek berê dest pê kir. Min xwe dîsa di eynî wê heywanê de li hember eynî wan rûyên berê dît. Ew der wek

xwe mabû, tenê germa wê xurtir bûbû. Min nizanîbû çawa ew  
bawêşînkên  
ji qeselan ketibûn hemû destan, ketibûn destê hemû  
sondxwaran, destê dadyar, destê parêzgerê min û destê çend  
rojna- .  
mevanan. Rojnamevanê ciwan û jina hûrik jî herdem li wê derê  
bûn; wan ba li xwe nedikirin, dengê xwe nedikirin, tenê li min di-  
A A nerm.  
Min xwêdana ser rûyê xwe zuha kir û ez hinekî bi ser hişê xwe  
hatim. Min nas kir ez li kuderê bûm gava navê serdebîrê mala  
pîran  
li ber guhê min ket. Sermiyanê dadgehê jê pirsî ka dêya min gazin  
ji  
min dikirin an na. wî got erê lêbelê ne wê tenê gazinên xwe ji  
xweru  
û merivên xwe dikirin, xuyê hemû xanînişînen wê derê wilo bû.  
Sermiyanê dadgehê xwest baş bizanîbûya eger wê gazin ji min  
dikirin  
çima min ew xistibû wê wargehê. Serde bîr rusa jî got erê, lê vê  
carê tiştê li erêya xwe zêde nekir. Pirseke din jê hat kirin û wî  
bersiva  
xwe da û got ku roja binaxkirinê, ew li aramiya min ecêbmayî  
mabû. Ji wî hat pirsîn wî çî dixwest bi wê gotina aramiyê bigota.  
Wê gavê serdebîr li pozê solên xwe nêrî û got ku min nexwestibû  
careke dawîn li diya xwe binêriya, ez tu carî li ser wê negiriyabûm  
û  
piştî veşartinê min seraser da ser rê, ez hinekî bi tenha xwe li ser  
gora

wê nemabûm. Tişteki din jî bala wî kişan, dibû û ew mat hiştibû:  
karmendekî ji nav karmendên kefenkirin û veşartina miriyan jê re  
gotibû ku min temenê dayê nizanîbû. Demeke bêdeng di wê  
navberê  
de buhurî û sermiyanê dadgehê jê pirsî ka ew bi wê şahidiyê li  
ser min û ne li ser yekî din axifibû. Serdebîr di vê pirsê de  
nedigihşat  
û sermiyan jê re rave kir û got: "Qanûn wilo ye, gerek e ez vê  
pirsê bikim." Paşê wî ji dadyar pirsî ka wî dixwest çend pirs ji yê  
şahid  
bikirana û yê dadyar bi dengê bilind got: "Ma ji vê rûreşiyê  
mezintir? Na ev yek bes e." Dadyar gotina xwe bi dengê wilo  
qube  
got û di eynî wextê de bi nêrînên mirovekî serketî li aliyê min  
nêrî. Wê gavê, û ji bo cara pêşîn piştî gelek salên dirêj, ez nizanim  
çima, lê wek keran li min hat û ez hatim bigiriyama çunkî min nas  
kir ku kesên liwê derê pir ji min diqeherîn.  
Piştî ku sermiyan ji sondxwaran û ji parêzgerê min xwest ka pirsên  
wan hebûn, wî gazî dergevanê wargeha pîran kir. wi tiştê ku ji  
hemû şahidan dihat xwestin ji wî re jî dubare kir. Gava yê  
dergevan  
derbasî eywana dadgehê bû, wî li min nêrî û di ô de rûyê xwe ji  
min guherand. Pirs jê dihatin kirin û wî jî bersivên wan da. wi got  
ku min nexwestibû dayê ji bo cara dawîn bidîta, ku li ber laşê wê  
min cixare kişandibû, ku ez razabûm û ku min qehwa bi şîr  
vexwaribû.  
Min wê gavê nas kir ku di eywana dadgehê de bêhna mirovên  
rûniştî ji min pir teng dibû û min ji bo cara yekemîn nas kir ku ez

sûckar û tawanbar bûm. Sermiyan ji dergevên xwest ku wî çîroka  
79

qehwa bi şîr Û cixarê dubare bikira. Dadyarê giştî li min nêrî û di  
nêrînên wî de çirûskên tenaziyê eşkere bûn. Wê gavê parêzgerê  
min

rabû ji dergevan pirsî ka wî jî bi min re cixarak kişandibû. Dadyar bi  
hêrs dijî vê pirsê derket. "Ma kî ye yê tawankar li vê derê? Paşê ev  
çi

hawe ne ku mirov bixwaze ku şahidên sûckariyê bên pîs kirin ta ku  
bawerî bi gotinên wan ên ku dîsa jî pir xurt dimînin qels bibe!"

Lêbelê

sermiyanê dadgehê ji yê dergevali xwest bersiva pirsê parêzgerê  
min bida. Devê kalo ket hev û got: "Ez dizanim ku min çewtiyek  
kir. Lê min ceger nekir cixareya ku Axa dirêjî min kir negirta."

Sermiyanê

rûniştinê dawiya gişan ji min pirsî ka min jî dixwest tiştê  
bigota Û min got: "Na, tenê ez dixwazim bêjim ku yê şahid rast  
dibêje.

Rast e ku min cixarake da wî." Wê gavê dergevan hinekî mat  
bû, li min nêrî weke ku bi wê nêrînê dixwest bigota mala te ava te  
ez rûspî kirim. Ew dudilî bû, lê paşê got ku wî bi xwe xwestibû  
qehwa bi şîr ji min re bianiya. Parêzgerê min wê gavê bi dengê  
qube û biserketî got ku mirovên sondxwar li wê derê ê rûmet û  
giraniya

vê yekê bizanibin. Lêbelê yê dadyar di ser serê me gişa re bû  
wek gurîna tavê û got: "Erê çima na? Axayên sondxwar ê rûmet û  
giraniya vê yekê bizanibin. Û ê bigihêjin wê dawiyê ku mirovekî  
biyanî

herdem dikare bibêje fermo ji te re qehwak, lêbelê lawikê ku li ber laşê jina ku ew jê çêbûye gerek bigota na." Dergevan zîvin ciyê xwe li ser dîwançeyê û rûnişt.

Dema bû dora Thomasê Perez, dergevanekî dadgehê bêgav bû ket ber milê wî ew gihand ciyê şahidiyê. Perez got ku wî bi taybetî diya min nas kiribû û tenê carekê, roja veşartina wê, ew çav li min ketibû. Sermiyanê dadgehê jê pirsî min wê rojê çi kiribû û Perez vegerand:

"Ez ji ku zanim? Ez bi xwe wê rojê pir bi keder bûm û min tiştê nedît. Kederê rê nedida min ta ku min bizanî bûya çi dibû. Ji bo min ew derd derdekî wilo mezin bû ku ez bêhiş ketim. Ji ber vê yekê min nikarîbû Axa bidîta." Parêzgêrê giştî jê pirsî ka wî bi kêmanî

dîtibû ku ez giriyabûm. Perez vegerand û got na. Wê gavê dora dadyar jî hat bigota: "Axayên sondxwar ê rûmet û giraniya vê 80

yekê bizanibin." Parêzgerê min bi wê gotinê hêrs bû û di nêrîna min de wî mesele pir mezin kir gava ji Pêrez pirsî "eger wî dîtibû ku ez nedigiriyam". Pêrez got: "Na". Kesên hatibûn temaşekirinê di hundirê dadgehê de kenyan. Parêzgerê min zendikên kirasê xwe

li hev badan û bi dengê qube û jixwebawer di wê navê de got: "Vaye tiştê ji vê dozê ji me re tê xuya kirin: her tişt rast e û tiştê rast tune!" Mirûzê dadyar kirî bû û wî hema serê qelemeke resas di

sernavên pelên ber xwe de diçikand.

Dadgeh pênc deqan rawestiya û di wê navberê de, parezgêrê min ji min re got ku baş bû, ku tiştan bi awakî pir hêja ji bo min didan

dû hev. Paşê gava dadgehê dîsa dest pê kir, me li Cêleste guhdarî kir. Navê wî ji aliyê berevaniyê hatibû xwestin û berevanî jî bi xwe ez bûm. Cêleste car caran berê xwe bi aliyê min dikir, dinêrî û di nav destên xwe de kumekî ji qeselan li hev badida. wî bedlê şerwal û çakêtê xwe yê nû li xwe kiribû. wî ew-deste carinan di rojên yekşeman de li xwe dikir dema bi min re dihat temaşekirina hespbeziyê. Lê ez bawer im ku wî gerden bi ser gumlikê xwe de li xwe nekiribû û di şûnê de, wî tenê bişkokek ji misê xistibû hustuyê xwe û bet xwe girtibû. Ji Cêleste hate pirsîn ka ez zibûnê wî bûm. wî vegerand " Erê, lê bi ser de jî ew heval bû." Li ser pirsê nêrîna wî di min de, wî vegerand ku, di nêrîna wî de, ez mêr bûm. Ji wî hat pirsîn wî bi wê gotinê çî dixwest bigota û wî got ku her kesî dizanîbû maneya wê gotinê çî bû. Li ser pirsê ku dihat gotin ku ez mirovekî dûrî civatê bûm, Cêleste di derheqa vê yekê de tenê got ku rast bû ku min gotinên vala ji xwe bernedidan. Avokatê giştî jê pirsî ka min perên xwarina xwe li bal wî herdem di wextê de dida. Bi vê pirsê Cêleste kenîya û got: "Pirsê peran di navbera me de tiştekî pir biçûk bû." Gava ji wî hat pirsîn nêrîna wî di tawankariya min de çî bû, wî destê xwe danî ser mîla ciyê rastbêjîyê û diyar bû ku wî ji bo wê pirsê tiştek amade kiribû. wî got: "Ji bo min bi xwe ev bobelatek e. Herkes dizane bobelat çine, Xwedê wan bi ser kesî de neyne. Ew mirovan ji desthilanînê dixin û bêçare dihêlin. Bizanibin ku ji bo

81

min bi xwe ev yek bobelatek e." wî ê gotina xwe dirêj bikira dema sermiyanê dadgehê jê re got ku baş bû ew yek bes bû û ew spas kir.

Bi wan gotinên sermiyanê dadgehê, Cêleste di ciyê xwe de sar bû, nema dizanîbû çî bikira çî nekira. Paşê wî got ku wî gotina xwe tev nekiribû. Sermiyan jê xwest ku wî gotinên xwe kurt bikirana.

Cêleste

dîsa got ku ew yek bobelatek bû û sermiyan jê re got" Baş e, me fêhm kir. Lê em ne li vê derê ne ta biryarnaman di derheqa malwêranîn

û bobelatan de bidin. Bes e, mala te ava." Weke ku tiştê ku ji Cêlestehatibû kiribû, wî wilo jî berê xwe ber bi min ve kir. Min wê gavê bawer kir ku çavên wî ji ber du hêsiran dibiriqandin û lêvên wî

ji ber neçariyê dilerizyan. wî dixwest bi wî rûyî ji min bipirsiya ma çiyê din bêtir ji destê wî dihat ta ku wî ji bo min bikira. Min tişteke negot û ez ji ciyê xwe bi qeysî serê derziyê jî neliviyam, lêbelê di temenê

min de, ew cara pêşîn bû ku min xwest mirovek hembêz bikira. Sermiyan dîsa bi hişkî jê xwest ew vegeriya ciyê xwe û Cêleste rabû û çû û di nav wan kesan de li ciyê xwe rûnişt. Paşê, ew di rûniştina

dadgehê giştî de wilo ma. wî hinekî xwe bi pêş de xwar kir, enîşkên xwe danîn ser ejnûyen xwe û, ew kumê ji qeselan di nav destan de, wî guhdarî kir. Dora Marie hat. Wê kumek dabû serê xwe lê dîsa jî xweşik bû. Kêfa min bêtir jê re dihat dema wê porê xwe berdida. Min ji ciyê xwe dizanîbû çîçikên wê ên ne pir giran

çawa bûn û min lêva wê jêrîn, ew lêva herdem hinekî werimî nas kir. Ew gelekî bêhteng dixuya. Bi pirsê pêşîn seraser jê hat xwestin

wê ji kengî ve ez nas dikirim. Wê vegerand ji dema ku wê li bal me kar dikir. Sermiyan xwest bizanîbûya çi bûn pêwendiya wê bi min re û wê vegerand ku ew hevala min bû. Wê bersiva pirsek din da û got ku erê rast bû ku wê ê ez bikirama. Dadyar pelên dossiera ber xwe li hev da û ji nişkê ve xwest bizanîbûya pêwendiya me kengî dest pê dikir. Wî xwe xeşîm kir, wek ku hayê wî ji tiştê nebûya û piştî bersiva Marie ~ got ku ew roj, wek ku jê re xuya dibû, roja piştî mirina diya min bû. Paşê wî bi zaraveke tenazawer got ku Xwedê giravî ji bo wî ne hêsan bû ku ew têteta nava jiyana kesane ya Marie, lêbelê (û bi wê yekê dengê wî tûjtir bû) wî karê xwe xweş

nas dikir û dizanîbû ku gerek wî xwe di ser wan uif û adetan re bidîta.

wî ji Marie xwest ku bi kurtî behsa wê roja hanê bikira. Marie nexwest dengê xwe bikira lê ji ber ku yê dadyar engirî, ew li ser ketina

me ya avê, çûyîna me ya sînemayê, û vegera me bal min axifi.

Marie îfada xwe dabû û paşê, yê dadyar li bernameyên filmên wan rojan nêribû û wî ji Marie xwest ku wê bi devê xwe bigota navê wî filmê çi bû. Marie bi zimanekî sade vegerand ku ew filmek bû

Fernandel

tê de dilîst. Dema wê tev kir, te di eywana dadgehê de derziyek jî bavêta dengê wê ê bihata. Dadyar wê gavê bi awakî pir giran rabû ser xwe, tiliya xwe ber bi çavên min kir û bi dengê ku bi



rastî dileriziya got: "Ji xwe re li vî mêrê hanê binerin, axayên sondxwaran.

Ev mêrê hanê dotira roja mirina diya xwe diket avê, bi jinikekê re derdiket û diçû sînemayê sebra xwe bi fîlmekê kenawer dianî. Tiştê ez dixwazim ji we re bêjim tenê ev bû." Bi van gotinan ew li ciyê xwe rûnişt û bêdengiya giran car din xwe li eywanê pêçand. Lê di wê bêdengiyê de Marie ji nişkê ve kire kûrekûr. Wê bi girî got ku ew yek ne rast bû, wê dixwest tişteke bigota lê bêgav dibû tersî wan tiştan bigota, ku wê baş min nas dikir û ku dizanîbû. ku min tişteke nerind nekiribû. Lê dergevanê dadgehê li ser îşareta Sermiyan

rabû bi destê wê glft û ew vegerand ciyê wê. Dadgehê berdomand.

Piştî wê yekê, kî ê bi rastî guhê xwe bida rastbêjeya Masson?

Masson

got ku ez mêr bûm, mêrekê mêran, rastû dilpak bûm. "Ûwî ê bêtir bigota ku ez mêrekê qenc bûm." Kesî nikaribû guh li Salamano

jî bikira dema wî got ku ez li ber sehê wî ketibûm û ku ez bi wî sehê re qenc bûm. Dema pirs min û diya min jê hat kirin, wî got ku tişteke min û wê tunebû me ji hev re bigota û, ji ber vê yekê, min ew xistibû mala pîran. "Gerek e mirov di vê yekê bigihêje, gerek

e" lê bêguman kesek di vê yekê nedigihast û dergevanê dadgehê bi destê wî glft û ew vegerand ciyê wî.

Raymond rastbêjê dawîn bû û dema dora wî hat, wî îşareteke biçûk

da min û seraser got ku ez bêşûc û bêguneh bûm. Sermiyanê

dadgehê wê gavê jê re bi lêv kir ku wî dikarîbû nêrîn û ditinên xwe ji bo xwe bihiştana û tiştên ku jê dihatin xwestin tiştine berbiçav bûn. wî jê xwest tenê bersiva p~ bida, devê xwe vekira dema jê bihata xwestin. Sermiyan jê xwest wî bi dirêjayî û bi awakî xw~ pêwendiyên

di navbera wî û yê kuştî de rave bikira. Raymond bi xwe li qetekî digerrîya û werîsek bi dest ket. wî got ku mêrikê hatibû kuştin ji roja ku wî sîlak daweşandibû xwişka wî bi rastî ji wî bi xwe diqeherî. wî dadgehê jê pirsî ka sedemine hebûn ji ber wan wî mirovî

dikarîbû ji min bi xwe jî biqehiriya. Raymond got ku hebûna min li ser peravê tesaduf bû. Wê gavê yê dadyar jê pirsî na xwe çawa

ew nameya ku bûbû sûcê kuştinekê bi destê min bi xwe hatibû nivîsandin.

Raymond vegerand ku ew tesaduf bû. Dadyar wê gavê got ku tesadufê ji destpêkê di vê bûyerê de barê zîyanan li ser wicdanan

giran kiribû. wî pirsî ka ew jî tesaduf bû ku ez neketibûm navberê Raymond û yarıka wî gava wî sîlak daweşandibû wê, tesaduf bû ku ez çûbûm polîsyanê ji wî re bûbûm rastbêj, tesaduf bû ku gotinên ku min di şahidiya xwe de gotibûn bi rastî tu bingeh ji wan re tunebûn.

wî xwest bi pirseke dawîn tev bikira û ji Raymond pirsî karê wî çi bû, çilo xwe xwedî fikir. Gava Raymond vegerand: "Ez enbardar

im", yê dadyar bi sondxwaran da zanîn ku li gor tiştên dihatin bihîstin, şahidê min qewadî fikir. wî berdomand ku ez hevdest

û hevalê wî qewadî bûm. Tawankariya min tawankariyeke pir pîs bû

û ji ber ku bi karên dijî sinc û exlaqê girêdayî bû, pîsîtiya wê bêtir dibû. Raymond xwest li ber xwe bida û avokatê min ev gotinên hanê

protesto kir, lêbelê sermiyanê dadgehê ji wan xwest ku ew rehet rûniştana ta ku dadyar gotinên xwe tev bikira. Wilo jî dadyar ji Raymond

re got: "Tenê tiştê min î biçûk heye ez dixwazim li gotinên xwe zêde bikim: ew hevalê te bû an na?" Raymond vegerand: "Erê, ew dostbiiakê min bû." Paşê dadyar berê xwe bi min ve kir û eynî pirs ji min kir. Min li Raymond nêrî û dît ku wî awirên xwe ji min nequrmiçandin. Min jî vegerand "Erê." Bi wê gotina min dadyar

li sondxwaran vegeriya û bi dengê qube got: "Eynî mêrê ku roja pişti mirina diya xwe diket nava pîsîtiyên bêhawe mezin ji bo sedemine pir biçûk û tewş mêreke kûşt ta ku wilo jî wî kareke bedex1aqiyê

ku nayê binavkirin safî bikira."

Agir ketibû parêzgerê min û nema dikaobû bêtir xwe bigirta. Bi rûniştina yê dadyar re ew rabû ser xwe û bi dengê bilind axifî. wî herdu destên xwe bilind kirin û wê yekê hişt ku zendikên kirasê wî bihatana xwarê û xêza qemîsê wî yê nişastekirî û ûokirî xuyabû: "Ev

çi ye ev çi kar e? Ma tawanbariya wî binaxkirina diya wî ye an kuştina

mirovekî ye?" Kesên ku hatibûn temaşekirinê kenyan. Lê dadyar

dîsa rabû ser xwe, kirasê xwe li xwe pêçand û bi lêv kir ku  
pêwendiyine

bi xwe pir xurt, bingehîn û pateok di navbera wan herdu tiştan  
de hebûn. Mirovê ku ew pêwendî nedîtana ji xwe ew ê, mîna  
berevanê

birêz, mirovekî kawik û sade bûya. wî bi dengê xurt berdomand:

"Erê, erê ez vî merê hanê tawanbar dikim ku wî bi dilê kuşdarekî  
cendekê dayikekê binax kiriye." Van gotinên dawîn xuyakirin  
bêpîvan li kesan kêr kirin. Parêzgerê min milê xwe hejand û  
xwêdana eniya xwe zuha kir. Eşkere bû ku ew bi xwe jî bi wan  
gotinan

hatibû hejandin û min nas kir tu tişt ji bo min ne baş derbas  
dibûn.

Paşê, tiştan bi lez dane dû hev. Dadgeh ji bo wê rojê tev bû. Gava  
ez ji seraya dadmendiye derketim û min berê xwe da trumbêlê,  
min di wê bêhnika kurt de rengên şevê ji şevên havîne nas kirin.  
Min xwe di wî bajarî de kêfxweş didît û min pir ji wê bêhnika êvarê  
hezdikir. Di taiitiya trumbêla dorgirê de, di tarîtiya girôxana xwe  
ya ku da ser rê, min hemû dengên rojane ên wî bajari nas kirin.  
Min hemû dengên wê bêhnîkê deng bi deng bihîstin. Erê min ew  
dengên hanê yek bi yek bihîstin ne wek ku ew ji derve lê ji nava  
jihalketina

min derdiketin. Qîina rojnamefiroşan di dawiya rojê de  
pişti şikestina germê, çîveçîva çûkên dawîn di meydanake biçûk  
de,

ineina tramwayan ku di kuçeyên cadên jora bajêr de dizivirîn, û  
gumeguma

xwe li asmanan digirt dema şevê xwe bi ser benderê xwar

dikir, erê van hemû dengan ji min re, wek ji mirovekî kwîr re,  
dibûn

çend perçe ji rêyekê ku berî ketina min ya zindanê min xw~  
nas dikir. Erê, berî anuha bi gelekî, min di wê bêhnikê de gelekî  
xwe kêfxw~ didît. Berê, dema min berê xwe dida malê, tiştê ku li  
dawiya wê rêyê li bendî min bû xeweke sivik û bê xewn bû. Lê  
tiştêk

hatibû guhertin, tiştêk nema wek berê bû. Li hêviya roja din ez  
ne ber bi malê çûm lê vegeriyam zindana xwe. Erê mirov dikarîbû  
bigota ku wan rêyên nas ên di asmanên havînê de hatibûn xêzkin  
ne tenê dikarîbûn mirov ber bi xewa şîrîn bibirana, Lêwan ber bi  
odeyên teng ên girtîxanan jî dikarîbûn bibirana.

IV

Li kuderê be, ta li ser rûniştêka tawanbariyê be jî, bi mirov tiştêkî  
balkêş û xw~ tê dema behsa wî dibe. Hem ji aliyê dadyar û hem ji  
aliyê parêzgerê min ez dikarim bibêjim ku pir behsa min hat kirin,  
belkî bêtir li ser kes û xuyê min ku li ser cirma min. Her yekî ji  
aliyêkî

dengê xwe dikir lê ma ferq eke wilo mezin di navbera wan  
herduya

de hebû? Parêzger destên xwe ber bi asmanan bilind dikir û  
digot erê ew tawabar e lê ji bo kuştina wî mêrikîji min re uzr û  
behane

peyda dikir. Dadyar destê xwe dirêj dikir û digot tawanbar lê  
tu sûc û behane ji tiştê min kiribû nedidît. Lêbelê tiştêkî di wan  
danûstandinan

de ne ~kere dihiştin ku bêhiia min teng bûbûya. Tevlî

karûbarên min pir bûn min carinan xwe nedigirt û dikir di wê navberê

de tişteke bigota lê parêzgerê min her carê bi destê min digirt û digot: " hiş be ji bo doza te çêtir e." Min bala xwe dayê ku wan dixwestin bêyî min ev doza hanê çareser bikin û tişt wilo jî li ber

çavên min derbas dibûn bêyî ku min bikaribûya dengê xwe bikira. Wan kesan tevne çarenûsa min dihûnandin bê ku ji min bipirsîna bi

kêmanî nêrîna min çî bû. Car caran min dixwest hema wilo gotinên wan bibirriya û bigota: "Hê, ma wilo dibe? Ma yê tawanbar li vê

86

derê ez im an na? Çavên xwe vekin û bizanibin ku tawanbarbûyî ne tişteke bêrûmet e. Bihêlin ez tişteke bêjim." Lê gava min baş bala

xwe dayê min dît ku bi rastî tişteke min tunebû min bigota. Paşê ez dizanim ku mirov nikare bi awakî dûr û dirêj bala ,kesan bikişîne. Wek nemûne ku mirov nikare guhê xwe bi dirêjayî bide mirovekî din ez dikarim bêjim ez pir zû ji gotara dadyar sar bûm. Di dirêjîya hemû gotara tawanbarkirinê de tenê çend hevokan, çend livên destê

wî û çend risteyên dirêj bala min kişandin.

Bi ser de jî eger ez ne şaş bim, ez bawer dikim ku tiştê dadyar dixwest bigota ew bû ku min biryara wê kuştina hanê di serê xwe de berê çêkiribû, ku min xwe jê re amade kiribû. wî bi kêmanî xwest ev yek bipeytanda. "Axayên min, ez ê vê yekê ji we re dubare

bipeytînim. Pêşî li ber ronahî û rastiya pir xurt ya tiştên berbiçav

û paşê dema ez ê dilê reş yê vî tawanbarî bi saya psîkoloj iyê ji we re

rohnak bikim." wî bi kurtebirô behsa bûyeran kir, ji mirina dayê dest pê kir. wî dîsa got ku ez mirovekî wilo xwînsar bûm û min guh li tu tiştî nedikir. Min ta temenê diya xwe jî nizanîbû. wî got çawa dotira roja mirina wê diyê ez bi jinekê re ketibûm avê, çawa ez

çûbûm sînemayê û min filmekî ku Femandel tê de dilîst dîtibû.

Dawî

wî behs kir çawa ez bi Marie re vegeyriyam malê. Wê gavê ez xweş di gotinên wî de negihaştim ji ber ku gava wî behsa Marie dikir,

wî bang wê dikir "Yarika min", û ji bo min bi xwe, Marie Marie bû û ne tişteki din bû. Paşê ew vegeyriya ser çîroka Raymond. Min bala xwe dayê ku dema ew li ser tiştan dipeyivî wî bi zimanekî xweş

ew rohnak dikirin û baweriya mirovan bi gotinên wî dihat. Li gor wî min û Raymond me bi hev re xwe li yarika Raymond kiribû yek û min bi wî re name nivîsand ta ku min ew jinik ber bi wî ve baniya

û wilo jî bihiştta ku ew Raymondê "napak" ew jinika hanê bêşanda. Min li ber perava deryayê girrê xwe di dijminên Raymond de dabû û ew sor kiribûn. Raymond di pevçûnê de biiindar bûbû û min demançe

jê standibû û ez bi tenha serê xwe vegeyriya bûm ta ku bi za. nebûn min ew demançe bi kar baniya. Wek ku min biryara wê kuştinê

di serê xwe de çêdikir, min wilo jî yê Ereba kuştibû û ew biryar

bi gewde kiribû. Ez li hêviya wê yekê mabûm û "ta ku dilê min biketa  
cih ku min karê xwe gihandibû serî", min piştî gu1leya pêşîn, bi bêhna fireh, herdem bi zanebûn, çar gulleyên din berdabûn. Min bîra her tiştî dibir û min xweş dizanîbû çî dîkir. wî berdomand:  
"Ez serê we neyşînim, axayên min. Min ji we re ta bi derziyê ve kir û got çî bûn ew tiştên berê vî mirovê hanê dane kuştinê. Ez car din dubare dîkim û dibêjim ku vî mirovî bîra her tiştî dibir û dizanîbû çî dîkir. Gerek e hûn vê yekê ji bîr nekin ji ber ku ev cirma, ev tawana  
hanê ne tawaneke adî ye ta dilê we bi yê tawankar bişewite û fikira  
sûc ûbihanan di serê we de çêbibe. Axayên min, ev mêrê hanê ne dîn e û ne zarok e. Ew xwedîhiş e, jîr e. Ma ne we lê guhdarî kir û we dît ku ew dizane bersivên xwe bide? Ew rûmeta gotinan dinase.  
Na mirov nikare bibêje ku wî bi nezanebû kir."  
Min guhdarî dîkir, dibihîst ku di derheqa min de dihat gotin ku ez mirovekî xwedîhiş bûm. U min îem nedikir çawa xasiyetên mirovekî  
wek her kesî dikarîbûn bûbûna barine giran li ser milên wî dema ew di dadgehê de tawanbar dibû. Di nav tevgerên dadgehê de, ez dikarim bêjim ku bi kêmanî vê yekê bala min dikişand û dihişt  
ku ez ecêbmayî bimînim. Min nema bala xweda yê dadyar.  
Dengê wî gihaşt guhê min gava wî got: "Binerin, axayên min, ma vî mirovî bi qeysî serê derziyê poşîmanî ji we re daye xuyakirin? Di



hemû dirêjahiya vekoünê de, vî mirovî tu carî ji ber kambaxiya  
karê  
xwe li ber xwe neketiye." Wê gavê jî wî berê xwe bi min ve kir,  
tiliya  
xwe ber bi min ve dirêj kir û bê ku min bi rastî bizanîbûya wî çi  
ji min dixwest, wî dîsa dev avêt min. Ew bêguman wilo radipelikî  
min ji ber ku min di dilê xwe de dizanîbû ku wî rast digot. Rast bû  
ku ez li kuştina yê Ereb ne gelekî poşman bûm lê dîsa jî min  
nizanîbû  
çima wî girrê xwe ji min nedikir. Min dixwest bi zargermî jê re  
bigota ku bi rastî di temenê xwe giştî de ez tu carî poşman  
nebûbûm.  
Min di jiyana xwe de guh li tiştên buhurî nedikir û tenê tiştên  
îro û sibehê bala min bi awakî xurt dikişandin. U di wê rewşa ku  
88  
wan ez xistibûmê, min nikarîbû helbet dengê xwe wilo bigihanda  
ru kesî. Di wê rewşê de, maren min nebûn ku min xwe diltenik û  
xwedîyê hîsên rind û pak bida xuyakirin. Min xwest dîsa li dadyar  
guhdaîi bikira ji ber ku wî dest pê kir behsa canê min kir.  
wî ji sondxwaran re rave kir ku wî xwe bi ser hinava min de xwar  
kiribû lê di wê hinavê de ru can nedîtibû. wî digot ku bi rastî ez  
mirovekî bê can bûm ku tişteki min û mirovan bi hev re tunebû, ku  
heyvanê sinc û axlaqê bi min re peyda nedibû. wî got ku ez ji van  
tiştan gişan bêpar bûm û berdomand: "Bêguman em nikarin  
gazina  
van tiştan jê bikin û bêjin çima ew li bal wî tunene. Gava tişteki ji  
ba  
Xwedê di nava yekî de tunebe mafê me tune em bêjin çima ew tişt

kêm e. Lê eger doz bibe doza dadmendiye, vê gavê nabe em çavên xwe bigirn û di zîyan û bedkariya mirovekî de bibuhurin û bexşînê bixwazin. Hêsan e ku mirov bêje gerek mirov tê bibuhire lê di dadgehê de lêbuhirîna hêsan gerek zehmetir bibe. Gerek dilê mirovan bi dadmendiye re be wê di ser her tiştî re bibîne, bi taybetî dema valahiya dilekî wek dilê vî mirovê hanê mîna çalek bêbinî be û ne dûr e ku rojekê hemû civat tê werbe." Wê gavê wî behsa danûsatandinên min bi diya min re kir. wî di dêbatên pêşîn de behsa wan tiştan kiribû û ew dubare kir. Lê dema wî dest bi dira min kir devê wî nema ket hev. wî ji tawana min dirêjtir kir, bêpîvan dirêj kir. Min nema dizanîbû wî çî digot û tenê ez bi germa rojê hesiyam. Bala min venegeriya ser gotinên wî gava wî hinekî bêhna xwe berda û bi dengê gelekî nizim û kwîr berdomand: "Axayên min, ev dadgeh sibe ê biryarnameyê di derheqa dozekê de bide ku hew doz jê pîstir hene: kuştina bavê. Li gor gotinên wî, mirov nikarîbû bawer bikira çawa kesekî dikarîbû destê xwe dirêjî ruhê bavê xwe bikira û tişteki wilo dijwar bikira. wî pir hêvî dikir ku dadgeha mirovan berî ya Xwedê bê sistî û bê dîlovanî ew yek ê seza bikira. Lê eger wî tawana min pir kambax didît û ku dilê wî ji ber wê pir dêşiya, wî diwêrîbû bigota ku dilê wî bêtir ji ber sersariya min dêşiya. Herdem li gor nêrînên wî, mirovê ku diya xwe bi awakî mecazî dikuşt û xwe ji civata mirovan dûr dixist, ew mirov ne dûr bû ji wî kesê ku destê xwe dirêjî ruhê bavê xwe kiribû û ew kuştibû. Mirovê bi reneki

remzî dikuşt rê li ber kambaxiyên mirovê ku bi rastî dikuşt vedikir  
û

destûra kuştinê dida. Paşê, wî dengê xwe bilind kir û berdomand:  
"Ez bawer dikim, axayên min, ku hûn ê fikira min pir xerîb nebînin  
eger ez ji we re bêjim ku ev mêrê anuha li ber me ye tawanbar e jî  
bi kuştina bavê ku ev dadgeh sibehê ê li ser biaxife. Wilo jî ez  
dixwazim

ku ev mêrê hanê bi. tawana kuştina bavê jî bê cezakirin."

Xwêdanê li ser eniya dadyar dibiriqand û bi wan gotinan wî ew  
xwêdan zuha kir. wî dawî got ku berpirsiyariya wî dijwar bû û tiştê  
ku jê dihat xwestin tiştêkî pir dijwar û rencawer bû, lê wî ê dîsa  
karê

xwe bi dilekî xurt bigihanda serî. wî got ku ciyê min di nav civata  
mirovan de tunebû û çêtir bû ez ji ber çavan biketama ji ber ku  
min

hemû destegê û rêkên wê civatê bi qirşikekî nedikirin. wî  
berdomand

ku min nikarîbû gazî dil û dilovaniya mirovan bikira ji ber ku  
min tiştêkî ji wî dilî û ji wê dilovaniyê nas nedikir. wî got "Ez serê vî  
mirovî bi kêfxweşî ji we dixwazim. Erê ez vê yekê ji we bi dilekî  
rihet

dixwazim eger min di nav salên pir yê karê xwe de ceza seijêkirinê  
carinan xwest, ev cara pêşîn e û ez dibînim ku bi rastî mirovek  
hêjayî sezayekî wilo ye. Du tişt hene vê gerdênbiênê pewîst dikin,  
pêşî gerek e ku daxwazeke îlahî xurt bê parastin û ji aliyekî din  
nepakiya

vî rûyê ku tenê ziyar jê dibatin.

Dema dadyar ji nû ve rûnişt, bêdengiyê demeke baş dirêj xwe li

hundirê dadgehê pêçand. Ez bi xwe ji ber germa hundir û matmayînê

gêj bûbûm. Sermiyanê dadgehê hinekî di ber xwe de kuxiya û bi dengekî sist ji min pirsî ka min dixwest tiştê bigota. Ez rabûm ser xwe û ji ber ku dilê min û axiftinê hebû min hinekî tevlihev kir û hema çawa tişt hatin serê min min got ku min nedixwest ew mêrikê

Ereb bikuşt. Yê Sermiyan got erê û berdomand ku wî ta wê gavê îem nekiribû çawa min destgeha berevaniya xwe saz dikir. wî got ku berî ku bibûya dora parêzgerê min, ew ê kêfxweş bibûya eger min jê re rave bikira çima min ew mirov kuştibû. Min tevlihev kir û li gel ku min dizanîbû ku kenê kesan ê bi min bihata, min bi lez got ku suc sucê rokê bû. çend kes di eywana dadgehê de kenyan.

Parêzgerê min milên xwe bilind kir û piştî min di cih de bû dora wî. Gava bû dora wî, wî got ku wî ê bi saetan bêguman dirêj bikira û wext bi xwe dereng ketibû. wî ji sermiyan xwest ku daniştin

biçûya danê piştî nîvro û daxwaza wî bi cî bû.

Di eywanê de piştî nîvro bawêşînkên mezin ên ser elektrîkê bayê giran di hundir de li hev didan û di destên sondxwaran de bawêşînkên

biçûk û rengînê giş bi hev re diliviyên. Parêzgerê min jî ez çî bêjim devê xwe vekir û nema girt. Ji nişkê ve min lê guhdarî kir ji ber ku wî digot: "Erê rast e min kuştîye." Her ku wî behsa min dikir wî bi wî dengî û bi wî şêweyî hema digot "Ez, min". Ez pir ecêbmayî

mam. Min xwe bi aliyê cendirmekî ji herdu cendirmeyan xwar

kir û pirsî çima wî hema digot "Min, ez". Yê cendirme got huş be  
û paşê berdomand: "Hemû parêzger wilo dikin." Min ji xwe re got  
ku bi wî awayî wî dîsa min dûrî doza min dibir, wî tu rûmet ji min  
re nedihîşt gava xwe dixist şûna min. Lê ez bawer dikim ku hingê  
ez ji wê oda daniştinê dûr ketibûm. Parêzgerê min bi xwe neket  
serê

min û ji min re kenawer xuyabû. wî tiştêkî wilo berbiçav û dirêj  
dijî gotinên dadyar negot û bi lez di ser lêtûjkinên wî re derbas  
bû. Paşê wî jî behsa canê min kir. Bi jîrbûyîna ew bi rastî nedigihîşt  
toza yê dadyar. wî got: "Min jî xwe bi ser hinava vî merovê hanê  
xwar kir û bi tersî axayê birêzê berpirsyarê wezaretê gelî, min  
canek

dît. Ez dikarim bibêjim ku ew can ji min re wek pirtûkeke vekîî  
xuya

bû." wî di wê pirtûka nava min de xwendibû û dîtibû ku ez  
mirovekî

dilpaqij û karkerekî bîrbir bûm, ku min ji can û dil û bêwestan  
ji bo xwedanên karê xwe kar fikir, her kesî li wê derê ji min hez  
dikir û min di ber dilê herkesî de dida. Li gor gotinên wî, li ser rûyê  
axê law hew di ser min re ji diya xwe re qenctir û baştir hebûn. Ta  
ji

min hatibû min diya xwe di nav xweşiyê de xwedî kiribû, lê dawiya  
gava nema ji min hat ez wê di wê xweşiya hanê de xwedî bikim,  
min ew xist maleke pîran û li wê derê min dizanîbû ku ew ê di re-  
91

hetiyê. de bûya. wî berdomand: "Ez bi xwe fêm nakim çima di vê  
dadgehê de wîqasî axiftin û di ber re jî rexne li ser van malên pîran

çêbûn. Eger em bixwazin başbûna van encumenan bipeytînin  
gerek  
e em ji bîr nekin ku dewlet bi xwe alîkariya wan ya diravî dike."  
Ubelê  
wî li ser veşartina diya min dengê xwe nekir û min nas kir ku  
ew yek ji berevaniya wî kêmbû. Uji ber van hemû hevokên bêserî  
û bêdawî, ji ber hemû van saet û rojên dirêj ên di wan de axiftin  
tenê  
li ser canê min bû, her tişt li ber çavên min bûn mîna aveke bêreng  
di nav de ez gêj dibûm û erd li dora serê min digeriya.  
Dawî, tenê tê bîra min ku hêna parêzgerê min diaxifi gava ji  
cadeyê  
û di nav wan hemû dîwar û eywanên dadgehê re dengê borîazana  
krêmfiroşekî li ber guhê min olan da. Min xwe di nav gerrînokên  
bîranînên jiyaneke de winda kir, jiyaneke ku ji min dûr diket,  
jiyaneke nema ya min bû. Wê jiyaneke bi xwe re tiştên xweş anîn:  
hemû  
xweşiyên biçûk û mezin, bêhnên taybetî yên havînan, tara ku  
min jê hez dikir, carinan jî rengê asimanan di çend êvarên taybetî  
de û ken û kirasên Marie bi xwe re anîn. Min wilo jî naS kir ku  
hebûna  
min li wê navberê, di hundirê wê dadgehê de tiştêkî pûç bû û  
min ji hemû dilê xwe xwest ku ew xirecir zû tev bibûya ta ku ez  
vegeriyama  
selûla xwe û min xwe berdaya nava tevnên xewê. Min pir  
guhê xwe p.eda parêzgerê xwe dema wî ji sondxwaran xwest ku  
wan karkerekî dilpaqij ku ji ber deqake bêhişî xwe winda kiribû  
neşandana mirinê. Di nav barên min de barê tawan û poşmaniya

min ya ebedî liser canê min barên herî giran û dijwar bûn û wilo jî wî ji bo min zurûfên sivikkirî dixwest. Dadgeh sekinî û parêzgerê min wek ku ji hal ketibûya li ciyê xwe rûnişt. Hevkarên wî ber bi wî ve hatin û destê wî guvaştin û her yekî got: "Tişteki pir hêja bû, ezîzê min". Yekî ji wan berê xwe bi min ve kir weke ku dixwest bigota:

Te dît! Ma ji wilo çêtir? Min serê xwe bi erêyî hejand lê bi rastî ji ber ku ez westiyayî bûm, min ne ji dilê xwe wilo jê re xweş kir. Li gel ku li derve roj diqulipî û ku şewata rojê baş şkestibû, ez pir westiyayî bûm. Dengine ji cadeyan dihatin û ji wan denga min nas

kir ku hênika hiya êvarê xwe bi ser bajêr de berdabû. Em giş, erê em

giş li wê derê li bendî tişteki bûn û ew tiştê hanê jî tenê bi min ve girêdayî bû. Min li hundirê eywana dadgehê car din nêrî û çavên min rastî çavên rojnamevanê bi çakêtê cûn û jina otomat hatin.

Wê

gavê hate bîra min ku di hemû dirêjbûna rûniştinên dadgehê de min çavên xwe li Marie negerandibûn. Min ew ji bîr nekiribû lê ji ber pîrbûna karûbarên xwe, ez jê re vala nebûbûm. Min ew di navbera

Cêleste û Raymond de dît û wê gavê wê ji min re îşaretek biçûk da wek ku dixwest bigota: "Dawî ez hatim bîra te". Rûyê wê ku nerehetî li ser xuyanê bû bi min re dibişirî. Dilê min girtî bû û ji min nehat min bersiva wê bişirîna wê bida.

Dadmend vegeyriyan ciyên xwe. Ji sondxwaran re bi lez rîstek pîrs hatin xwendin. Di nav wan pîrsan de gotinên "tawankar bi tawaniya

kuştinê" ... "xwe ji kuştinê re amade kirin" ... "zurûfen sivikkirî" li ber guhên min ketin. Sondxwar derketin û ez jî ketim wê oda ku berê min xwe lê ragirtibû. Parêzgerê min xwe gihand min û bi devekî sivik, bi pişteke rast û bi dilgermiyeke ku tu carî berê wî ji min re nedabû xuyakirin ew peyivî. Li gor baweriyên wî tişt baş ji bo min derbas dibûn û eger ez bihatama cezakirin ew ê pir û pir çend salên zindanê an çend salên karên wrê bûna. Min jê pirsî ka maê . min hebû min biryarnameya dadgehê bişekanda eger ew biryarname ne li gor dilê min bûya. wî ji min re got ku na. Tektîka wî ew bû ku piştî ku ceza dihat birrîn, wî nedixwest doza tu tiştî bikira û bi derewan serên kesên sondxwar bêşanda. wî ji min re rave kir ku nedibû ku hema her yek rabûya doza guherandina biryarnama dadgehê bikira û bi ser de jî, ew tişt ne wilo hêsan bû. Gotinên wî ketin serê min. Eger mirov ne li dengê dilê xwe lê li yê mejiyê xwe guhdarî bike, tiştê ku parêzgerê min digot di ciyê xwe de bû. Eger me qîma xwe bi biryarnameya dadgehê neaniya û doza daniştineke din bikira, gelek kaxez bi derewan ê li ser hev kom bibûna. Parêzgerê min got: "Rê û çareya Îstînare herdem li ber me ye. Lê ez dizanim bêşik ku gotina dadgehê wê baş be."

93

Em gelekî, nêzîkî sê çarîkan, ez bawer dikim di wê oda biçûk de man. Dema dengê zingilekî gihaşt me, parêzgerê min rabû ser xwe û got: "Sermiyanê sondxwaran wê bersivan bixwîne. Tu ê derbas



bibî tenê dema biryamama di derheqê te de hatiye satandin ê bê xwendin." Terqîniya deriyên ku vedibûn û dihatin girtin dihat min. Kesine li ser pêlikan bi lez dadiketî û hildikişiyên û min nizanîbû ka ew pelik dûr an nêzîk bûn. Paşê dengê dûr gihaşt guhên min û wî dengê di eywana dadgehê de tiştêk dixwend. Dema zingil dîsa lêxist û deriyê qefesa tawanbarbûyî nê li ber min vebû, bêdengiya ku

xwe li eywanê girtibû ber bi min ve hat, ew bêdengiya wê hîsa taybetî

ya ku di nava min de peyda bû dema min bala xwe dayê ku rojnamevanê

xort awirên xwe ji min birrîbû. Wextê min çênebû min li aliyê Marie mêze bikira ji ber ku sermiyanê dadgehê ji min re bi rengêkî tevlihev got ku bi navê milletê fransî serê min ê di meydanake

umûmî de bihata jêkirin. Ez bawer dikim ku wê gavê min hîsên mirovan li ser rûyên wan xwendin û min nas kir nêrîna wan di min de çî bû. Ez bawer dikim ku wan rûmeteke didane min. Herdu cendirman bi min re paşê gelekî qenc derketin. Parêzgerê min destê

xwe danî ser destê min. Ez nema bi tu tiştî difikirîm gava sermiyanê

dadgehê ji min pirsî ka min dixwest tiştêk bigota. Ez ramiyam û min got: "Na." Wê gavê wan ez ji wê derê derxistim û birim.

v

Keşê ku tê serlêdana mehkûman sê caran xwest bihata û hersê caran

min got na. Ma ez ê çî ji wî re bêjim? Dilê min nabijeaxiftinê û ez

ê di wexteke baş nêzik de wî bibîniiri. Tiştê ku anuha bala min  
dikişîne  
ew e ku ez ê çilo xwe ji mêkanîka îdamê xilas bikim, anuha ez  
dixwazim bizanibim ka mirov dikare qederê hinekî biguherîne,  
caresereke  
din ji vê dawiyê re bibîne. Ez ji selûla xwe hatim derxistim  
û ketim yeke din. Di vê selûla nû de, gava ez xwe dirêj dikim, ez ji  
94  
bilî asmanan tişteki din nabînim. Hemû rojên min wilo derbas  
dibin:  
ez xwe li ser piştê radimidînim, destên xwe dixim bin serê xwe  
û li ser rûyê asmanan dinerim çawa reng têne guhertin û çawa  
rengên  
rojê ber bi yê şevê dirin. Ez nizanim çend caran lê bêguman  
gelek caran min ji xwe pirsî ger di nav mehkûmên îdamê de çend  
kes hebûn xwe ji vê çarenûsê xelas kiribûn û berî saeta mirina xwe  
bi awakî din miribûn û rêza pasebanan ji hev xistibûn. Ez poşman  
bûm çima berê min baş guh nedabû çîrokên îdamê. Mirov gerek  
her gav guh liwan pirsan bike ji ber ku kesek nizane sibe ê çi bi  
serê  
wî bê. Wek her kesî min kurtenivîsên wan serpehatiyên di  
rojnaman  
de xwendibû lê pirtûkine taybetî li ser wan pirsan helbet hebûn û  
ji  
ber ku wan bala min nekişandibûn min tu carî li wan nenêrîbû.  
Eger min ew pirtûk bixwendana, ez ê belkî di wan de rastî çend  
çîrokên  
revê bûbûma. Min ê nas bikira ku bi kêmanî carekê qewimîbû

û çerxa felekê rawestiyabû, ku bi kêmanî carekê bexteweriyê ev. çarenûsa ku nedihat guhertin guherandibû. Erê egertenê carekê ev

yek bibûya, ez bawer dikim ku ew ê ji min re bes bûya û dilê min ê karê mayî ê bigihanda serî. Piraniya caran rojnameyan digotin ku mirovê tawankar dibû deyndarê civakê û gerek wî deynê xwe bida.

Lê deyn û deynadarî û gotinên wilo tiştêkî ji xeyala mirovan re nabêjin.

Tiştê girîng rev û hebûyîna wê bû, şikenandina qederê bû, tiştê girîng bezek ber bi warê dînbûyînê bû. Dînbûyîn girîng bû ji ber ku wê bi xwe re hemû deriyên hêviyê di rûyê mirovê tawankar de vekira. Hêviya herî mezin jî bi xwe ew bû ku mirovê tawankarkirî

bireviya, bazdaya û ku li kuçeya cadakê, gulleyekê ba biqelaştta û ew bida xwarê. Lê gava min bala xwe xweş dida tiştan, ew guhertinên

hanê di xewnên şevan de jî ji bo min çênedibûn û wê mêkanîka hişk ez zeft dikirim û ez bernedidam.

Lê min fikir û nedikir, min nikarîbû ev takîda bêcir qebûl bikira. Min nikarîbû ew mirina ku wê takîdê bi xwe re dianî qebûl bikira ji ber ku di navbera wê û mercên derketina wê de wek erd û asmanan

hebû. Hukmê kuştinê ji deqa derketina xwe mirinek bi girr bi xwe 95

re dianî lê mercên derketina wî î hukmî gelekî dikarîbûn bihatana guhertin. Biryara ku di derheqa min de ne pir cedî xuya kir ji ber

gelek tiştan: ji ber ku hukmê mirinê di saet heyştê êvarê û ne di saet pênçan de hatibû xwendin, ku ew hukwn dibû hukme ke din bûya, ku merovên ku ew derxistibûn merov bûn û cilên xwe diguherandin, ku ew bi navê dazanînek ne diyar wek « Miletê fransî ( an almanî, an çînî) erê ji ber van hamû tiştên ku dikarîbûn bihatana guhertin, biryarnameya kuştina min wek tişteki cedi neket serê min. Lêbelê, ez çî bêjim, ji kêlîka ku ew biryarname derketibû, min dizanîbû ku ew bi gewde û berbiçav dibû, wek wî dîwarê ku min laşê li ser xwe pehn dikir. Di wan gavan de çîrokek ku diya min berê ji min re li ser bavê min digot hat bîra min. Min bavê xwe nas nekiribû û tiştên ku min xweş li ser vî mirovî dizanîbû ew bûn tiştên ku tenê dayê berê behs kiribû. wî carekê li îdamkirina kuşdarekî temaşe kiribû. Hîna ew neçûbû wek nexweşan lê hatibû û gava vegeriyabû, ew di danê wê sibehê de gelek caran vereşiyabû. Dilê min hinekî ji bavê min ji ber wê vereşandinê li hev diket, lê anuha, ez tem dikim ku ew vereşandin tişteki gelekî xwezayî bû. Ez nizanim çawa berê min nedidît ku ji kuştina mirovekî mezintir tunebû û ku bi awakî tenê ew kuştin di bin stûna asmanan de tişteki birûmet bû. Eger ez ji vê zindanê derketama, min ê li hemû hukmên îdamê temaşe bikira. Lêbelê ez bawer im ku min şaşîtiyek dikir dema min ev îhtimala hanê datanî ber çavên xwe. Dema min di serê xwe de xwe di destê sibehê zû de

xwe -li pişt rêza pasebanan mîna temaşevanekî azad didît, erê  
mîna  
temaşegerekî ku hatibû û piştê jî belkî dilê wî li hev biketa û  
vereşiya,  
dilê min wê gavê ji kêfek jehrînî dihat ji sînga min derketa. Lê  
mirov helbet nikare herdem li ciyê xwe giran rûnê. Min şaşîtiyek  
mezin fikir dema min ew îhômali di serê xwe de çêdikirin ji ber ku  
pişî wê xweşiya ku xwe berdida nava min sermake bêsinor xurt  
xwe  
li canê min dipêçand û bê ku min bikarîbûya tiştê bikira dibû  
qirçeqirça  
diranên min.  
Mirov nikare herdem biazilî li tiştan binere. Wek nimûne, min di  
wê zindanê de carinan di serê xwe de qanûn û destûrine nû  
derdixistin.  
Min cezeyên tawanbaran diguherandin. Min bala xwe dabûyê  
ku dema min ew destûrên nû çêdikirin, tiştê hen girîng di serê  
min de ew bû ku min herdem ji yê mehkûm re keysek, rêyek  
xelasiyê  
bihişt. Eger ew keysa xelasbûnê yek li ser hezarî jî bûya, wê yekê  
rêya xwe didît û dawiyek xweş dida bûyeran. Wî jî, min bawer  
dikir  
ku mirovan ji bo kuştinê dikarîbûn şirûbeke ji dermanên kîmawî  
çêbikirana. Ew şirûba hanê wê neh caran li ser dehan mirin bi xwe  
re ji yê nexweş re baniya (erê min di serê xwe de di şûna yê  
mehkûm  
de digot mirovê nexweş). Mercê vexwarina wê avê jî ew bû ku

nexweşê ku ew bi ser gewriya xwe de fikir gerek herdem  
bizanîbûya

ku ew şansê filitandinê li ber wî hebû. Dema min bi seriyekî rehet  
bala xwe dida karê wê mekîna gerden birr, min tê de kêmasî  
didîtin.

Devê wî satorî bi qeysî qirşikekî rêya xelasiyê ji yê mehkûm re  
nedihişt. Dema biryarnameya kuştinê di derheqa mirovekî de  
dihat

standin, ew gotina hanê dibû qeder û gerek ew mirov bimiraya. Ji  
bilî wê mirinê tu çareyên din di rûyê yê nexweş de nediman. wî  
saton

xweş karê xwe dizanîbû û eger rojekê biqewimiya û bi awakî  
gelekî dûrî aqilan wî saton bi cara pêşîn serî nebirriya, ji xwe cara  
dudyan û sisyan û he zan herdem li ber wî hebû. Wilo jî tiştê ken û  
giriye mirov pê tê ew bû ku yê mehkûm ji asmanan dixwest û lava  
fikir ku tişteke bi wî saton nehata. Erê kêmasiyên vê mekîna  
gerdenbirr

hebûn lê ji aliyekî din, ez bêgav bûm di serê xwe de bêjim ku  
bi rastî hemû raz û xurtbûna sazgehekê di karê wî satorî de bû. Wê  
biryarnameya dadgehê û wê mekîna mirinê tu rêyên felatê li ber  
yê

mehkûm nedihiştin. Bi kurtî, yê mehkûm ji bêgaviyê êdî alîkarî  
fikir

ta ku ew bê serêş û teşqeले bihata kuştin. Ew ji xêra wî bû ku tişteke  
di rûyê biryarnameya kuştina wî de derneketa û tişteke bi wê  
mekînê

nehata.

Ez bêgav jî bûm bibînim ku ta wê gavê nênnên min liser van pirsan

dûrî rastiye bûn. Bêyî ku min bizanîbûya çima min demeke pir  
97

dirêj bawer kir ku mirov dema ber bi guiiotînê( destgeha  
serbiriînê)

diçû, gerek bû ew bi textbendekê hilkişiya, çend pelikan ji ser erdê  
bilind bibûya. Ez bawer dikim ew sûretê hanê di serê min de ji ber  
şoreşa 1789an çêbûbû, ez dixwazim bêjim ji ber tiştên ku li ser vê  
destgeha îdamê ji min re berê hatibûn gotin an nîşanî min hatibûn  
kirin. Lê sibehekê hat bîra min ku carekê rojnameyekê li ser  
gerdenbiriîneke

ku pir deng dabû nivîsîbû û wê rojnamê sûretê  
destgeha'gerdenbiriînê

jî li ser rûyê pelên xwe xistibû. Destgeh liser erda

rast bû û bi qasî buhistekê jî çiyê ew ji rûyê erdê ne bilindtir bû.

Min bawer jî dikir ku destgeh ji wilo firehtir bû lê bi rastî ew tengik  
bû. Min nizanîbû çawa berê van tiştan bala min nekişandibûn û çawa  
, wa ez bi ser wan rastiyan ve nebûbûm. Destgeha li ser pelê  
rojnamê

gelekî ,bala min kişandibû ji ber ku ew pir bi hosteyi hatibû  
sazkirin.

Ew wek saeteke şewqdar bi zanebûneke mezin hatibû çêkirin. Lê  
wilo ye, dema mirov tişteki xweş nas nake, ew herdem wî tiştî di  
serê

xwe de pir mezin dike û baskan jê re çêdike. Gava ez di wê  
rojnamê

de çav li wî sûretî ketim, ez bêgav bûm bibînim ku tişt gelekî  
sade bûn û bi rastî mirovê ber bi wê destgehê diçû ew wek ku ber  
bi mirovekî din diçû û yek ji yekî ne bilindtir bû. Lê gava min ev rastî

bi çavên serê xwe dît, ez dikarim bêjim ku ez bi wê rastiye aciz bûm. Mirov herdem dixwaze di serê xwe de tiştan mezin bike û ciyekî

bilind bide wê gerdembiriînê, mirov dixwaze çend gavan ber bi asmanên bilind hilkişe. Lê ne gav û ne jî çara xelasê li ber yê tawankar

hebûn û vê carê jî destgeha mirinê bi giraniya xwe her tişt di bin xwe de diperçiqand: yê mehkûm bi bêdengî, bi hinek şermezarî

û bi gelek diqet dihat kuştin.

Ez her gav bi du tiştên din jî diramiyam: yek şefeq bû û yê din daxwaziya min ya bexşînê bû. Ez bi wan diramiyan li gel ku min ji xwe re digot ku baştir bû ku min ew ji bîra xwe bavêtana. Min xwe li ser piştê radimidand û li asmanan dinêrî. Min zor li xwe dikir û hemû bala xwe dida wî asmanî. Asman kesk dibû û êvar diket. Min bêtir zor li xwe dikir ta ku ez bi tiştine din bifikiriyama. Min guhdarî lêdana dilê xwe dikir û min nizanîbû çawa min ê bawer bikira ku ew dengê ku ji roja roj de ji min qut nebûbû ê bikarîbûya rojekê bi gihişo rawestibûya. Ez bi rastî ne xwediyê xeyalek wilo xurt im lê dîsa jî min zor li xwe dikir û min dixwest ew kêlîka hanê bidîta, ew kêlîka ku wêJêdanê ê nema ta qehte serê min dirêj bûbûya. Lê ez çî

bêjim, hemû tevgerên min pûç derdiketin û fikra şefeqê û daxwazi-

. ya min ya lêbuhurînê herdem ji serê min dervediketin. Wi10 jî dawiya

dawî, min ji xwe re digot ku ya. baş ew bû ku min bi derewan zor li xwe nekiribûya.



Ew di şefeqê de bi derketina rojê re dihatin, min ev yek dizanîbû.  
Bi kurê, min şevê gişî xwe li bendî wê şefeqê ragirt. Min tu carî hez  
nekiriyê ku tişt ji xafil bi ser min de bîn. Dema tiştekan ji bo min  
diqewime,  
ez dixwazim ji bo wî tişto amade û haydar bim. Wî jî dawiya  
dawî xew di şevan de nema bi çavên min bû û tenê ez bi rojê  
hinekî ji xwe re radizam. Di wan şevên dirêj de, ez bi bêhnek fireh  
li bendî çêbûna ronahiyê li ser cama asmanan mam. Tiştê herî  
zehmet  
ew saeta bi dû û gumanan bû, ew saeta ku min dizanîbû ku ew  
tê de herdem derdiketin û bi karên xwe radibûn. Ji nivê şevê û vir  
de ez bendewar dimam û min bi haydarî guhdarî dikir. Guhên min  
berê tu carî wilo li dangan negeriyabûn û tu carî jî berê min  
wilqase  
dengên wilo hûr nekiribû. Ez dikarim bêjim ku bi awakî di hemû  
wê demê de şansê min hebû ji ber ku tu dengên payan ne gihastin  
min. Dayê gelek caran digot ku mirov tu carî nikare bêje ku ew ji  
sedî sed perîşan û reben e. Dema rengê asmanan dihat guhertin û  
ronahiya rojek nû derbasî hundirê selûla min dibû, min gotina  
dayê  
rast didît. Erê, ez ne bi gişto bêoxir bûm ji ber ku ne pir dûr bû ku  
carekê di wan şevan de min dengên payinan bikira û wilo jî ji tirsê  
dilê min di sînga min de ê belav bûbûya. Dema dengê biçûk li ber  
guhên min diket, min bi lez berê xwe dida derî û guhê xwe bi textê  
wî diçespan. Min dengê her tişto dikir, ta dengê berdan û girtina  
hilma xwe û ez pir jî ditirsiyam dema ew dengê ji sînga min  
derdiket  
dibû mîna nalîna sehekî. Lêbelê eger bê ya dawî, ez ne wiqasî

bedbext bûm ji ber ku ne dilê min di sînga min de belav dibû û her carê jî, bîst û çar saetên din lijiyana min zêde dibûn.

Karê min di şevcin de ev bû. Bi roj, ez bi daxwaziya xwe ya bexşînê xeîk dibûm. Ez bawer dikim ku ji vê yekê jî min tiştê herî hêja derxist. Min di serê xwe de hesabên xwe çêdikirin û hêjatirînên beşan

ji fikir û ramanên xwe berhev dikirin. Min herdem gumana herî kambax datanî ber çavên xwe, min ji xwe re digot ku daxwaza min î

bexşînê hatibû avêtin. "Baş e, wilo jî, ez ê bimirim.» Eşkere bû ku ez ê wilo berî kesine din bimirama. U her kes dizane ku ev dunya hanê ne hêja ye ku mirov ji bo wê bijî. Min di nava xwe de baş dizanîbû

ku ew ne tiştêkî wilo pir girîng bû eger mirov sîsalî an heftêsalî bimira, ji ber ku di herdu mirinan de gelek mêr û jinên din ê bijiyana

û ev yek ê wilo bi hezarên salan jî berdewam bikira. Bi kurtbirrî, şik li vê-yekê nedibû. Mirin her mirin bû çî ez anuha birnirama çî pişti bîst salên din. Ubelê dema min tişt wilo di serê xwe de çêdikirin, ez hinekî aciz dibûm ji ber ku gava min mirina xwe pişti bîst salên din didît, dilê min di sînga min de bi hêrs bilind dibû û dihat derketa. Ta min ew coşa hinava xwe haş bikira, min xwe piştî wan bîst salan didît û car din pirsra mirinê ji xwe dikir. Eger dawîya mirovan liser rûyê erdê herdem mirin be, berbiçav bû ku saet û şiklê

mirinê dibûn pirseke pir biçûk. Wilo jî ( û gerek min ev "wilo jî"

ji ber çavên xwe windanekiribûya) wilo jî, eger daxwaza min ya lêbuhurînê

bihata avêtin, ji xwe gerek min ev yek qebûl bikira.

Gava min mirina xwe qebûl dikir, tenê wê gavê min dikarîbû bigota

ku mafe min hebû ku min gumana duduyan jî di serê xwe de çêbikira. Min ji xwe re li hev dianî û digot ku bexşîn ji min re hatibû.

Dema min çareya duduyan dida ber rûyê xwe û xwe azad didît, . coşa xwîn û laşê min kêfxweşiyek pir mezin ber bi çavên min dajotin

û ew dişewitandin. Tiştê nexweş wê gavê ew bû ku gerek min bi gema wê dilpekîniyê, wê kêxweşiyê bigirta, gerek min ew dengê jînê

di nava xwe de legem û haş bikira. Dema min çareya duduyan li ber xwe didît, gerek bû ku ez wek xwe bimama ta ku min qebûlki-100

rîna mirina xwe, di îhtîmala yekemîn de mumkintir bidîta. Dema ez bi ser diketim, min saetek bêhnfirehî ji xwe re peyda dikir û ew bi ser ketin, ew saeta aramiyê ne tişteki hindik bû.

Di bêhnikeyê wilo de keşê rêber xwest carek din bihata serlêdana min û min wê carê jî got na. Min xwe dirêj kiribû û ji regnê asamanê

ku bi ser boze ve diçû, nas kir ku êvar nêzîk bûbû. Min di serê xwe de wê gavê digot ku daxwaza min ya bexşînê hatibû avêtin û xwîna min hêdîka, bê helkehelk, di laşê min de digeriya. Min ê çî bikira ji hatina keşe? Ew cara pêşîn bû piştî demeke dirêj ku Marie dihat bîra min. Ji demeke dirêj ve namên wê nedihatîn~ Wê êvara

hanê, min ji xwe re got ku belkî wê nema dixwest xwe bêtir  
dostika

mirovekî bi gerdenbirrînê hukmkirî bidîta. Min ji xwe re jî got ku  
belkî ew nexweş bû an jî miribû. Ew tiştên hanê ne pir dûii aqilan  
bûn. Ma min ê çawa bizanîbûya çi bi serê wê hatibû ger ji bilî wan  
herdu gewdeyên me ên anuha ji hev veqetiyayî tu pêwendiyane  
din

me bi hev re girênedidan, tu dengên din em nêzîkî hev nedikirin. Ji  
wê gavê û pê de, min bi rasti nema guh li Marie kir û nema bêriya  
wê kir. Piştî mirina xwe, Marie nema ji bo min tiştek bû. Min didît  
ku ew tiştekî xwezayî bû ku min piştî mirina wê ew ji bîr bikira,  
wek

ku di eynî wextê de, min xwezayî jî didît ku piştî mirina min dost û  
nasan ê ez ji bîr bikirama. Mirinê tu pêwendî di navbera zindewar  
û

miriyan de nedihîşt û piştî mirina çima karê zindewaran ê bi min  
bimaya?

Gava min bi wî awayî li tiştan dinêrî, min nikaribû bigota ku  
ew fikra hanê bi min zehmet an nexweş bû. Mirov dawiya dawî bi  
rastî hînî her fikrê dibe û nema xema min bû.

Min wilo ji xwe re digot gava keşê rêber buhûii hundir. Dema ez  
çav li wî ketim, ez hinekî di cihê xwe de lerziyam. Wî ew yek dît û ji  
min re got metirse. Min jê re got ku li gor adetê gerek ew di  
wexteke

din de bihata. Wî li min vegerand ku serlêdana wî ya hevaltî û  
xêrxwaziyê bû û got Xwedêgiravî hayê wî yekcar jê tunebû ku min  
nedixwest ew bihata dîtina min. Ew ne ji ber wê yekê hatibû û li  
ser

ciyê min rûnişt û xwest ez li kêleka wî rûniştama. Min bi ya wî ne-  
101

kir, tevî ku min li ser rûyê wî nîşanên dilnazikbûyînê dît.

wî bazbendên destên xwe danî ser ejnûyên xwe, serê xwe xist ber  
xwe û li destên xwe nêrî. Ew demeke dirêj wilo ma û min bala xwe  
dayê ku herdu destên wî hem nazik û hem xurt bûn û wan destan  
ji

min re mîna du lawirên çalak û lewend xuya kirin. wî hêdîka ew di  
ser hev re dibirin. Paşê wî serê xwe xist ber xwe û ew demeke pir  
dirêj ma. Min bîstikekê bawer kir ku min hebûna wî liwê derê ji bîr  
kiribû lê wî ji nişkê ve serê xwe rakir, rûyê xwe ber bi rûyê min ve  
kir û got: "çima, çima te nedixwest min bibînî?" Min lê vegerand  
çunki baweriya min bi Xwedê nedihat. wî pirsî çawa min dikarîbû  
bigota ku ez ji wê yekê ji sedî sed serrast bûm û min vegerand ku  
min ji binê ew pirs ji xwe nedikir ji ber ku hebûn an nebûna Xwedê  
ji bo min tiştekî vala bû, pirsek bêrûmet bû. wî wê gavê defa sînga  
xwe rast kir, piştî xwe da dîwêr, herdu destên xwe vekirin û danîn  
ser rahnên xwe. Wek ku wî ji yekî din re û ne ji min re behs bikira  
wî rave kir ku gelek caran mirov dikare bawer bike ku ew ji tiştekî  
pir bawer e lê bi rastî ew baweriya hanê ne wiqasî xurt e. Min  
tiştek

lê venegerand. wî li min nêrî û pirsî: "Ma ne wilo ye?" Min lê  
vegerand

ku ew yek mumkin bû lêbelê eger ez ne bi temamî bawer  
bûma ji tiştên ku bala min dikişandin, min xweş dizanîbû çî bala  
min nedikişand. Pirsî wî ji min fikir yek bû ji wan pirsên ku bala  
min nedikişandin û min serê xwe bi wê tu carî nediêşand.

wî awirên xwe ji rûyê min birrîn û, bê ku hawê rûniştina xwe biguheranda,  
ji min re got ku belkî min ew gotin dikirin çunkî min xwe bêhêvî didît. Min jê re rave kir ku ne rast bû û ku min xwe winda û bêhêvî nedidît. Ez tenê ditirsiyam û ew tirsî min helbet di cihê xwe de bû. wî got: "Xwedê wê alîkariya te bike. Min gelek kesên di rewşa te de dîtin û wan gişan berê xwe ber bi wî ve dikirin." Min vegerand ku mafên wan kesan hebû ew tişt bikirana û vê yekê jî nîşan dida ku bi kêmanî wextê wan ji bo Xwedê hebû, ne yê min. Min bi xwe alîkariya tu kesî nedixwest û bi ser de jî, wextê min pir kêm bû. wî tiştî bala min nedikişand û min nedixwest wextê xwe yê

101

mayî bi derewa winda bikira.

Wê gavê ji liva destên wî min nas kir ku keşe di nava xwe de hinekî bêhteng dibû. Lê wî bersînga xwe rast kir, destê xwe di ser kirasê xwe re bir û qermîçokên wî rast kir. Paşê wî di nav gotinan de ji min re got: "hevalê min". wî wilo bang min kir, ne ji ber ku biryarnameya

gerdenbirrîne di derheqa min de derketitû lê çî ye ne çî ye ji ber ku ew hukmê mirinê li ser eniya me gişan hatibû nivîsîri. Min wê gavê gotina wî birî û got ku dawîya me herduyan ne wekhev bû û hebûna mirinê li pêşîya me giştan nikarîbû di ber dilê min de bida. wî heq da min û gotina xwe berdomand: "Belê rast e, lê eger tu di demeke nêzîk de nemirî tê derengtir bimirî. Kesek nikare ji ber mirinê bireve. Ma tu vê dawîya pir dijwar çawa dibînî?" Min lê

vegerand ku mirin çî anuha çî paşê ew bi xwe ji bo min tiştêkî  
wekhev

bû, ew tiştêkî bêrûmet bû.

Bi.gotinên min keşe ji ciyê xwe pekiya û çavên xwe zuq xistin  
çavên

min. Min bi wê lîstikê xweş dizanîbû. Min bi Emmanuel an bi  
Cêleste re dilîst û bi awakî giştî min rora wan gişan dibir û dihişt ku  
wan awirên xwe biqurmiçandana. Min di cîh de nas kir ku keşe jî  
xweş bi wê lîstikê dizanîbû ji ber ku awir û mijankên wî nediliviyên.  
wî çavên xwe xist çavên min û got: "Na xwe wilo tu bêhêvî dijî û  
bawer dikî ku piştî mirinê tu jiyanên din li peşîya mirovan  
tunene?"

Min vegerand û got: "Erê".

Wê gavê wî serê xwe xwar kir, awirên xwe birrin û dîsa rûnişt. wî  
ji min re got ku gunehê wî bi min dihat. wî got ku wî nizanîbû çawa  
bawer bikira ku mirovekî dikarîbû wilo bifikiriya. Lê eger wî  
dizanîbû

an nizanîbû ev ne karê min bû û min tenê dizanîbû ku wî  
dêst pê kiribû bêhna min teng fikir. Min jî awirên xwe ji wî  
şikendandin,

berê xwe da paceya odê û milê xwe da dîwêr. Min xweş lê  
guhdarî nekir dema wî dest bi pirsên xwe kir, lê çunki dengê wî  
wilo

melûl û lerzdar bûbû, min çêtir li wî guhdarî kir.

wî xweş dizanîbû ku daxwaza min ya bexşînê ê bihata qebûl kirin,  
lêbelê barê gunehiyê li ser milên min herdem pir giran dima û

~°3

gerek min xwe jê pak bikira. Di dîtina wî de, dadmendiya mirovan

ne tiştêk bû, tenê ya Xwedê her tişt-bû. Min bala xwe dayê ku ew cara yekemîn bû wî ez tawanbar kiribûm. wî got ku ceza ku dadgeha

mirovan di derheqa min de birrîbû nikaôbû gunehê min bişûsta. Min lê vegerand ku min nizanîbû guneh çî bû û ez li gor biryara dadgehê diçûm: ez tenê ta~barek bûm û min ceza xwe xwaribû. Min deynê wê tawankariyê dida û qebûl nedikir tiştêkî din ji min bihata xwestin. Ew bi bersiva min dîsa rabû ser xwdê di wê selûla teng de ew ê bi kuderê biçûya? wî tenê dikaôbû rabûya an rûništa. Min awirên xwe berdabûn ber xwe û zuq li erdê dinêrî. wî tenê gavek ber bi min avêt û, weke ku nediwêrîbû nêziktir bibûya, ew pişti wê gavê di ciyê xwe de rawestiya. wî di nav sîşên pencereyê re

li asmanan dinêrî û got: "Tu şaş î lawê min dema tu bawer dikî ku tiştêkî din ji te nayê xwestin. Ev tişt wê belkî ji te bê xwestin." Min di ci de lê vegerand: "Ma çî wê ji min bê xwestin?" "Wê ji te bê xwestin ku tu bibînî." "Ma ez ê çî bibînim?"

Keşe li hawirdora xwe nêrî û berdomand. Min wê gavê bala xwe dayê ku dengê wî qels bûbû, te digot westiyayî bû: "Êş ji van hemû keviran tê xwarê, ez vê yekê xweş dizanim. Gava ez li van keviran dinerim, dilê min herdem teng û tije tirs dibe. Lê ez dizanim ku ta yê herî bêoxir jî di nav we de gava ji dilê dil dinêre, ew dibîne ku ji vê tarîtiyê tûyekî asmanî derdikeve. Wê ji te bê xwestin ku tu li vî tûyî binerî."

Ez wê gavê hinekî germ bûm. Min got ku min bi mehan li kevirên wan dîwaran nêrîbû û pir xweş dizanîbû ku di wan de ne tişt û ne kes hebûn. Min belkî demeke dirêj berê li wan nêrîbû û di nava wan de ez li tûykî geriyabûm. Lêbelê ew tûyê ku ez lê digeriyam di



rengê roka asmanan, di rengê agirê daxwaziyê de bû. Ew tûyê ku ezbêçare lê geriyabûm tûyê Marie bû û anuha ez ji wê gerê westiyabûm.

Min.nêrîbû lê nedîtîbû tiştêk ji xwêdana wan keviran pejiqî bû.

Keşe bi xemgînî li min mêze kir. Min anuha hemû piştî xwe da-  
~°4

bû dîwêr û rohnîya rokê di ser eniya min re dişemitî. wî tiştine gorin

lê ew tişt negihaştin guhên min. wî bi lez û coşecan ji min xwest ka wî dikarîbû ez maç bikirama. Min got: "Na". Wê gavê ew zîvîî û ber bi dîwar ve çû. wî bi giranî destê xwe di ser wî dîwîî re bir û di ber xwe de bi dengêkî nizim ji min pirsî: "Na xwe ru wîqasî ji vê axa hanê hez dikî?" Min dengê xwe nekir.

wî piştî xwe bi min ve kir û demeke dirêj wîlo bêdeng ma. Hebûna wî li bal min bêhna min teng fikir. Min ê jê bixwesta ku wî dev ji min berdaya bi rêya xwe de biçûya dema wî ji nişkê ve berê xwe bi min ve kir û bi dengêkî bilind got: " Na, ez ji te bawer nakim.

Ez xw~ bawer im ku te di temenê xwe de carinan di dilê xwe de xwestiyê ku piştî vê jîyanê jîyanekê din hebe." Min lê vegerand ku ew yek helbet rast bû, lê min ew tişt dixwest wek ku min gelek tiştên din jî dixwestin. Wek nimûne, min dixwest ku ez têr îî dewletmend

bûma, bi avjeniyê bezatir bûma, min dixwest ku devê min bi awakî bêtir lihevhatî bûya. Erê xwestina jîyanekê din û van hemû

tiştên din ji bo min wekhev bûn. Lê wî nehişt ku min bidomanda û

pirsî ka min ew jiyana din çawa didît. Min bi qîrîn wê gavê lê vegerand:

"Ew jiyanekê ku ez di wê de vê jiyana hanê bi bîra xwe tînim."

Min jê re jî got ku bes bû, min nema dixwest lê guhdaii bikira. wî dixwest hêna ji min re behsa Xwedê bikira lê ez nêzîkî wî bûm û min xwest ji bo cara dawîn ew liberxista ku wextê min pir hindik bû û min nedixwest ew wextê hanê bi Xwedêmedê re winda

bikira. wî wê gavê xwest şêweya axiftinê biguherîne û ji min pirsî çima min jê re digot "Monsieur, axa" û ne "Bavê !Tlin". Vê yekê bêhna min teng kir û min lê vegerand ku ew belkî bavê kesên din bû lê ne yê min bû.

- Na lawê min, wî got û destê xwe danî ser milê min. Tu ji ber korbûna dilê xwe nizanî ku ez bi te re me. Ez bi te re .me û ez ê ji bo te dua bikim.

Ez nizanî wê gavê çî bi min hat lê wek ku tiştek di nava min de biteqiya dunya li ber çavên min sor bû, Min dest pê kir ta ku ji min LOS

hat bi qîrîn hemû gotinên pîs jê re kirin. Min got ku şewat çêtir bû ji windabûnê. Min bi situkra cuba wî girtibû û hemû qehra nava min wek pêlan bi kêfxweşî ji hinava min pijiqîn û dilê min hênik kir. Baş bû, ma ne wî wilo dixwest ji min re diyar bikira ku ew ji baweriyên

xwe gelekî serrast bû? Lê hemû baweriyên wî nehêjabûn mûyekî ji serê jinekê. wî bi ser de jî nikaribû bigota ku ew bi rastî mirovekî zende bû ji ber ku jiyana wî wek ya miriyekî di gorê de ramidandî bû. Erê, ji wî werê ku ez destvala bûm û ji tiştekî ne serrast bûm. Lê ev ne rast bû. Ez ji xwe û ji her tiştî serrast û bawer bûm û

baweriya min ji ya wî bi sed taqî bêtir dihat bi wê jiyana ku ez dijiyam

û bi wê mirina ku di demeke nêzîk de ê bihata. Ev rastiya hanê ya min bû û eger ew ne tişteki wilo pir mezin bûya jî lê xwîna min û wê bûbûn yek. Min berê rast gotibû û hêna jî û herdem min rast digot. Min jiyana xwe bi awakî derbas kiribû wek ku dibû ku min ew bi awakî din derbas bikira. Min ev yek kiribû û ne ya din. Min ew tiştê hanê nekiribû lê di şûnê de ev tiştê din û paşê çima na? Rastî di kêlikekê de, di şefeqa rojekê de ê bi gewde û berbiçav bûbûya

wek ku min di hemû salên jiyana xwe de min xwe li bendî wê kêlîkê, wê şefeqê ragirtibû. Di hemû jiyana xwe de min tu carî bi rastî rûmeteke wilo mezin nedabû tutişî û min dizanîbû çima. wî bi xwe jî dizanîbû çima. Ji kezeba salên li ber min, ji dawîya rojên min herdem ber bi min ve bayek nediyar dihat û wî bayî di meh û salên jiyana min ya pûç û bêmane de her tiştên ji min re diqewimîn li ber

çavên min wekhev û şayik dikirin. wî bayî, wê hilmê nedihîşt ku min rûmeteke zêde bida tişteki ji wan tiştên ku ji min dihatin xwestin

û min nikarîbû bigota ku salên min yên buhîi rastir bûn ji wan salên min ên ku hêna li pêşiya min bûn. Ma çî rûmeta mirina kesên

din, hezkirina dayikekê, çî rûmeta xwedayê wî, jiyânên ku mirov ji xwe re dixwazin, qedereên ku mirov ji xwe re he1dibijêrin ji bo min hebûn? Erê çî rûmeta van tiştan ji bo min hebû eger ji roja roj de qederekê min wek milyarên kesên din ku wî keşeyî bang wan dikir "birayên min" he1bijartibû? Çî rûmeta van tiştan gişan hebû eger

tenê dawiyek li pêşiya min bû? Ma ew di vê yekê digihaşt, ma ew di

vê yekê digihaşt? Herkes hatibû bijartin û mirovên ne bijarte li ser rûyê erdê tunebûn. Ên din jî rojekê ê bihatana tawanbar û hukumkirin.

Ew ê bi xwe jî bihata hukumkirin û wilo jî wê çî rûmeta wê yekê hebûya eger wî mirovek bikûşt û paşê bihata ceza kirin bi rastî

ne bi vê kuştinê lê ji ber ku roja veşartina diya xwe ew negiriyabû? Rûmeta kuçikê Salamano ne kêmî rûmeta jina wî bû. Ew jinika wek mekînakê dilivîya tawanbar bû, jina Masson ya paîsî jî tawanbar bû

û wê Mariya ku dixwest min ew bianiya jî tawanbar bû. Celeste ji Raymond çêtir bû lê çî rûmeta wê yekê hebû eger Raymond jî bûbûya

hevalê min? çî rûmeta wê yekî jî ê ji bo min hebûya eger îro Marie devê xwe bida mirovekî din, eger wê lêvên xwe dirêjî lêvên Meursau1tekî din bikira? Ma vî mehkûmê hanê nas dikir ku ji dawiya

temenê min, ji kezeba musteqbek û ayendeya min ... û ez wilo bi ser de diqîriyam û bêhna min diçikiya. Min hêna gotinên xwe ji keşe

re tamam nekiribûn dema dergevanan ew ji nav lepên min derxistin

û xwe rakişandine min. Lê keşe ew haş kirin û paşê bêdeng demekê li min nêrî. Min bala xwe dayê çavên wî mişt hêsir bûbûn. wî serê xwe xwar kir û ji ber çavên min ket.

Dema ew derket bêhna min dîsa hate ber min. Ez pir westiyabûm  
û min xwe avêt ser textê xwe. Ez bawer dikim ez di xew re  
çûm ji ber ku dema ez şiyar bûm, stêrikan asmanê ber rûyê min  
dagirtibûn.

Dengên hawîrdorên gundan ber min ve hildikişyan. Bêhna  
şevê, bêhna erdê û xwê cênîkên min hênik dikirin. Aşitiya dilnişîn  
ya vê havîna di xew de mîna ava deryayekê bilind dibû û derbasî  
hinava min dibû. Di wê gavê de û di tixûbên şevê de. dengê  
keştiyan

gihaştine min, wan kirin tûtîn. Ew sûtîn û tûtînên hanê nîşanên  
çûyînên gemiyan ber bi dunyayeke din bûn, dunyayeke ku ji binî  
ve

min anuha nema guh lê fikir. Dayê ji bo cara pêşîn piştî demeke  
pir

dirêj hate bîra min. Miii bawer kir ku min dizanîbû çima dawî emir  
wê ji xwe re "dergîstiyek" dîtibû, çima wê xwestibû ji nû ve dest bi  
jiyanê bikira. Li wê derê jî, li hawîrdora wê wargeha ku jiyan lê ve-  
107

dimirîn, li wê derê jî êvar mîna bêhnikêkê ji aşîtiyek xemgîn bû.

Wilo

nêzîkî mirinê, dayê bêguman xwe azad û amade didît ta ku her  
tişt ji nû ve bikira û bijiya. Male kesekî, mare ro kesî ninebû li ser  
wê bigiriya. Min jî dît xwe amade dît ta ku ji nû ve min dest bi  
hertiştî

bikira. Wek ku wê qehra mezin hinava min ji napakiyê bişûşt, a  
canê min ji hêviyê vala bikira, min deriyê dilê xwe vekir. Di rûyê  
wê

şeva mişt nîşan û sitêrik de, min deriyê dilê xwe vekir û xwe berda

nava sersariya dilovan ya dunyayê. Dema min ew wîqasî nêzîkî xwe,  
mîna birakî nêzîkî xwe dît, min dît ku berê ez mirovekî bextewer bûm û min xwe hêna bextewer didît. Ta ku tişt nîvco nemana, ta ku min. xwe gelekî bi tenha serê xwe nedîta, hêviya min ya dawîn ew bû im roja gerdembirîna min gelek mirov ê bihatana temaşekirinê.

Hêviya min ew bû ku gava di roja kuştina min de ew ê çav li min biketana, wan ê bi nifret bikirana qîrîn.

108

### WEŞANÊN NÛDEMÊ

- .> BINGEHtN GRAMERAKURDMANCÎ. Celadet Bedir-Xan IGramer
- .> OC Û DtMART • Egîdê Xudo / Roman
- .> KESKESOR. Nûredîn Zaza / Çîrok
- .>DI FOLKLORAKURDÎDESERDESTIYEKEJINAN. Rohat/Lêkorin
- .> HU Û BEDEWIYAPtNÛSt • Melvned Uzun / Essay {Ceribandin}
- + MÎRZAMEHEME • Medenî Ferho / Roman
- .> MILKt EvîNt. Rojen Barnas / Siîr
- + BIYANÎ. Albert Camus Werger: Fawaz Hesên / Roman
- .> SEvtN sPÎ • Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî / Roman
- .> MISKÛ MIROV • Jotvi Steinbeck Werger: Firat Cewerî / Roman
- .> BEXÇEvt vîSNE • Çexov Werger: Firat Cewerî / Piyes
- .> LIBENDAGODOT. Saimuel Beckett Werger: Firat Cewerî / Piyes
- .> GOTINtN NAVDARANAmadekar: Firat Cewe,; / Aforisma
- .> GIRÎÎ • Firat Cewerî / Çîrok
- ∴ KEVOKASPÎ • Firat Cewerî / Çîrok

\*\*

ÇÎYAYÊ AGÎRÎ

Yaşar Kemal

Weşanxana ÇandaKurdî

YAŞAR KEMAL

ÇÎYAYÊ AGÎRÎ

Wêne: Abidin Dîno

Kuidiska Kulturfôrlaget / Weşanxana Çanda Kurdf

Box: 161 39, 103 23 Stockholm - SWEDEN

© Yaşar Kemal

Wêne: Abîdfn Dîno

Wergên Çerefnaz

Çapa Kurdî: Weşanxana Çanda Kurdf 1990 - Swêd

ISBN 9186146319

Bohuslänningens Boktryckeri AB, Uddevalla 1990

YAŞAR KEMAL

ÇÎYAYÊ AGÎRÎ

Weşanxana Çanda Kurdî

Li navsera çiyayê Agirîyê di bilindahiya car hezar û dused mîtroyan de, bi navê Gola Kûpê, goleke biçûk heye.

Gol di kûranî de ye û iirehiya wê bi qasî cihê bênderekê ye. Ne gol e çal e. Çarmedora golê ango çalê bi kevirên birqonekî sor û wek devê kêrê tûj hatîye pêçandin. Di nav axa qehweyî de a ku ji aliyê zinaran berbi sarincê teng dibe û tê, givarêk çêbûne. Li ser axa rengxwedî cih cih çîm şîn bûne. Piştî wê, şînayiya golê destpêdike. Ew , ne mîna şînayiyên din e. Li tu avan û li tu şînaniyan, gînayiyeke usa nehatiye dîtin. Şînekî tarî nerm û qedîfeyî.

Hersai gava berf dihele, bihar destpêdike, û li çiyayê

Agirî tezebûnekî mezin bejn dide, dora golê bi kulîlkên

kin û qalîn en ku ji bin berfê derdikevin, dixemilin. Rengê kulîlkan heya tu bixwazî birqonek in. Biçûktirîn kulîlk jî, li wir di rengê xwe de, wek ronahiya renga ji dur ve, şîn, sor, zer û mor dibiriqe. Ê bîhneke giran difîrîne. Ji ava golê a şîn û axa qehwerengî bihnek difûre ku meriv pê bêhe ş dikeve. Ji dur ve, ew bêhn tête pozê merivan.

Ê hersai gava li çiyayê Agirî, bihar têt, bi kulîlkan, bi axa qehwerengî, bi bêhn û rengê xweş ve, şivanên çiyayê Agirî en çeleng çavres, û çavxemîn û girs jî bi tiliyên xwe en zirav û dirêj radihêjin bilûrên xwe, û tèn ser gola Kûpê, li bin zinarên sor, li ser axa qehwerengî û li ser pişta bihara hezar salî, kulavên xwe radixînin û li çarmedora golê rûdinin. Hîna beriya ku tîrêjên rojê bavêjin di bin çurusîna ronahiya stêrkên Agirî en kombûyî de bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, dest bi lêdana strana hêrsa Agirî dikin. Ev ji berbangê heya roj diçe ava dem dike. Di vê navberê de, tam dema ku roj diçe ava çûkekî biçûk, mîna berfê sipî li ser golê difire, doş dibe. Çûk zirav û dirêj e û dûrvê hehecikê dide. Li ser golê pir bi lez dizivire, li ser hev xelekên sipî û dirêj çêdike. Ew xelekên sipî tel tel dikevin nav şînayiya golê. Dema roj diçe ava bilûrvan dev ji lêdana bilûrê berdidin, bilûran davêjin ser milên xwe û radibin. Çûkên ku li ser golê difire jî, bi hemî hêza xwe, wek brûskê xwe bera ser avê dide. Baskên xwe li ava şîn dixê, radibe û bi wî awayî se caran dikeve avê û derdikeve. Piştî jî difire û diçe, ji ber çavan wenda dibe. Piştî çûyîna çûkê, şivan jî bêdeng yeko-yeko, dudo-dudo ji golê bi dur dikevin û di nav tariyê şevê de winda dibin.



Ji êvarê ve hespekî boz li devê deriyê Ehmed rawestiyabû. Stuyê xwe dirêj kiribû, bi firnikê pozê xwe ê fireh mîna ku texte deriyê ku cîh cîh qelişî bû, bihn dikir. Berî herkesî, Sofiyê rîh sipî û rîh dirêj ew hesp li ber deriyê Ehmed dît. Li ser pişta hespê zînekî çerkezan ê bi zîv neqi şandî hebû. Zengûyên wî bi zîv neqişandibû. Sofî bi xwizika pişta xwe berbi hespê ve çû û nêzîkî wî rawestiya. Hevsarê hespê bi sîm neqişandibû û ji xelean zîn a ku ji zêr û sedef çêkirîbû, derbas kiribû. Di bin zîn de kulavekî ku xwesbûna neqişa wî ji dur ve diyar dibû, li ser pişta hespê bû. Li ser wî kulavî bi tayekî reng portaqalî wêneyekê kevin a royê çêkiri bû. Li pas, wêneya royê, jî dareke kesk a jiyinê bilind dibû. Li aliyê çepê jî her waha wêneyên ro û darê hebûn. Kêm zêde dihat bîra Sofî ku wî ew ro û dar li bin ciyan dîtibû. Diviya ew wêneyên han, nişana êl malbe-

10

tekê navdar bibûna.

Sofî demekî, bi tirs û terilî û bi şaşmayî nêzîkî hespê bû, bêdeng rawestiya. Gelo ev mîvanê mezin û bişan ê ku hatibû mala Ehmed kî bû? Di bîra xwe de ew damxe bir û anî, le peyde nekir ku ev nîşan a kîjan ezbet, beg û paşayî bû? Hew, wê nîşanê tirs xistibû dilê wî. Nîşanên welê herdem bê xêr dibûn. Ê herdem bi tirsekê dihatin bi tirsekî diçûn. Li wan doran kesekî ku xwediyê hespekî usa bûna, tunebû. Paşê Sofî nîgana hemî ezbetên vê hêremê jî dinasîn. Bahar bû, û berfa çiyayê Agirî dest bi helînê kiribû. Li jêr, cîh cîh serê zinarên sor ji bin berfê derdiketin, kulîlkên berfê en zer zîl dabûn. Li ezmên refên qulîngan li pey hev

derbas dibûn û berbi gola Wanê ve diçûn.

Haya Ehmed ji tiştêkî tunebû. Di ronahiya berbangê de ji hundur dengê bilûrekê dihat. Sofî ji kevin ve dengê vê bilûra xweş dinasî. Bapîrê Ehmed Sultan Axa jî, bi vî awayî li bilûrê dixist. Bavê wî Resûl jî... Hîna kesekî ku ji mêrên vî malbatê xweştir li bilûr xistana ne hatibû Çiyayê Agirî. Dibe ku ne hatibû cîhanê jî. Heger Sofî waha bigota, de di cîh de bibûna ji ber ku sofî bi xwe jî bi bilûrvanîya xwe, li vê Rohilatê, Qefqasê, îran ve Tûranê nav dabû.

Sofî hinekî din nêzîkî hespê bû. Hîn pirtir ji nêzîk ve bala xwe da nîganê. Weke ku hespê gudariya dengê bilûrê ê ku ji hundir dihat, fikir, guhê xwe pel kiribû. Ehmed ji straneke kevin ya Agirî dixist. Sofî ew strana fêrî hemî bilûrvanên Agirîyê kiribû.

Hespê stûyê xwe baş ber bi deng ve dirêj kir. Sofî jî... ji demeke dirêj ve, ne li wê stranê xistibû ne jî guhdarî kiri bû. Çiyayêkî ewçend mezin çawa dikaribû ji dengê bilûre kê ev çend hêrs bibûna. Sofî di nav van ramanên seyr de mabû, diramiya û digot, heş û mejî nagihê karê mirovan. Çawa dikarin bi bilûrekê ewçend biçûk û zirav dengê çiyayekê xumxumîn û ewçend mezin derxînin. Heya ku ev il

mirovên ha, li vê cîhanê bijîn, ji firîna qertelê bigire heya Moristanê, ji derketina heyvê, rojê heye çûna wan a ava, ta mirin û mayinê de bikaribin hertiştî binasin. De aqil bigihênin rohnî û tariyê de bigihênin hemî tiştî, hemî tiştî, le hêza wan de têra mirovan neke. Le nikaribin bigihên sirra wî.

Û ciya di nav bilûrê de diherikî, zinarên bilind, şîp, şevên sayî û stêrik diteqîyan. Rohniya heyvê, diteqîya û çiya bi hemî heybeta xwe dimeşîya. Xwêdayî û bêhnçikyayî... Agirî mîna dêwekî girs bêhn dikişand. Sofî hilmkişîna Agirî ji pir kûr ve dibihîst. Berbi navçeyê cîhanê; dengê pir kûr û dur dihat. Her ku Ehmed lêdixist, hêrs û bêhnkişîna çiyê bilindtir dibû. Di demên waha de Sofî guhê xwe datanî ser axa çiyayê kelgirî. Her bi her çiya hîn bêhtir hêrs dibû. Bêhna wî kûr dibû, pir dibû, carekê radibû, carekê dadiket, parce parce dibû û bi hemî hêz û xisma xwe, xwe bera ser cîhanê dida. Piştî jî bêdengiyeye mezin diket nav cîhanê. Her alîyê cîhanê tenha dibû. Cîhan vik û vala mabû, çiyayê Agirî serê xwe girtibû ji vê cîhanê çûbû. Gur, teba, mirovên xwe, stêrik, heyv, roj, ba, baran, berf û kulîlkên xwe jî girtibûn, bi xwe re biribûn. Ev cîhan vala hiştibûn Ji çolan kerîyên pêzkoviyên xwe en çavbikil jî girtibûn û biribûn Ji dengê bilûrê de tenhanyî û bêdengiyek vejîyaû. Piştî, ji nişka ve cîhan, bi kulîlk, stêrk, bêhn, ava Sofî, masî û bi destên ahûyan ve li ber çavên Sofî ji nuh ve hati bû guhartin. Ew hespê ku li pêş çavên Sofî bû, hatibû guhartin. Ew wêneya royê a ku li ser piştî kulêv hatibû çêkirin, bican bûbû. Dara jiyinê a ku li paş wê rojê bû, ku lîlk vedan, pelên xwe vekirin. Dengê bilûrê bîstekê hâte birîn. Ro jî ji paş çiyayê Agirî mîna qursikekê sor derketibû. Sofî hat ser heşê xwe. Carekê li hespê carekê li derî nêrî. Hêsp jî serê xwe bilind kir. Bi çavên xwe en girs û xemgîn

12

li Sofî nêrî. Tirseke bêhoy ket dilê Sofî.

Sofî deng li Ehmet kir û got:

"Ehmed! Ehme!"

Ehmed dengê Sofî nasî. Ji wî re derî vekir û got:

"Fermo xalo".

Ehmed dema hesp dît, pêşî şaş bû. Page carekê li hespê carekê U Sofî nêrî.

Sofî got:

"Mîvanê te kê ye Ehmed? Bi xêr û xweşî hatiye"

Ehmet got:

"Mîvanê min nîne."

Herdûyan li hespê nêrî. Hesp ji ber derî çû, carekê li dora malê zivirî û hat li ber derî rawestiya. Hespekî dirêj û girs bû. Guhên wî tûj û nîç bûn. Serê xwe berbi ezmên hilda weke ku dixwest biîre le nehiriya

Mala Ehmed li bin zinarekê bû. Bi kevirên sor, girs, û ne-şikyayî ava bûbû. Derîyê wê mezin bû û tenê pencereyek wê hebû.

Sofî ramiya, Ehmed ji ramiya.

Sofî got:

"Ev hesp qismetê te ye"

Ehmed got: "Belê mafir ew hatiye li ber derî rawestiyaye.

Le gelo ev hesp ê kê ye?

Sofî: "Li ser kulavê wî nîgana wî heye. Min pir ji kevn ve, li cihekê ev nîşan dîtiye. Divê, ev nîşana cihekê belafiroş û tirsdar be. Le ê kê dibe bera bibe, ev hesp ê te ye. Ji ba xwedê ji te re diyarî hat.

Ehmed got: "Ji ba xwedê..."

Ma gelo ev belayek bû yan kêfxweşîyek bû?

Sofî, guherîna ruyê Ehmed dît û got:

"Ê kê dibe, bera bibe, ev hesp ê te ye. Le belê ev nîşan ji min re ne biyanî ye. Ev nîşan ji rojên pir kevn maye".

A duyim jî hespê ku xemla wî usa be, ne hespê herkesî

13

ye...

Sofî got:

"Pir mefikire, hespê bigîne, bibe vê riya jêr berde û vegere, heger hesp vejerîya carekê din bibe, se caran waha bike, û gotina xwe ajot:

"Heger carekê din hesp vejeriya ev hesp ê te ye: Xwedîyê hespê yekî mîr be, paşe be, padîşahê Osmanî, şahê Ecem, Korogî be jî, ev hesp nayê dayin. Tu dikarî serê xwe bidî le wî nedî. Emjî nema wî didin."

Roj derket, giloka ewrên tarî vebû. Tîrêjên ronahiyê xwe bera ser tariyê dan. Ehmed hesp girt, hesp bêdeng bû, suwarê hespê bû û berê wî da riya jêr. Li wir, hesp bera da û vejeriya, dema vejerîya ku ci bivîne, dît ku hesp li ba Sofî rawestyaye. Se caran ew kir dûbare kir. Her se caran jî hesp vegerya.

Ehmed got: Tistên ku tê serî, mirov dikşîne."

Çawa bibûna, xwediyê vî hespê de rojekê li hespê xwe bigeriyana. Êdî xwediyê hespê kî bibûna bera bibûna Ehmed nema dikaribû hesp vegerandana. Serê xwe dida le hesp nedida wî.

Hesp kişand axûr. Him bi kêf him jî bi tirs bû. Ji roja ku xwe nas kiribû heya nuha hespekî usa xweşik nedîtibû.

Sofî: "Heger xwediyê hespê yekî bêbav be û bibêje, teqes ez hespê xwe dixwazim de şer derkeve. Dema serê Agirî germ be bi cîhanê re şer dike." Ji bo vê yekê kêfa wî hat.

Ehmed jî bi wî re got:

"şer dike".

Berê gundîyên wan bihîstin ku hespekî kihêl hatiye li ber derîyê Ehmed rawestîyaye. Gundî hatin hesp dîtin. Paşê gundên nêzîk û hemî xelkên dora Agirî bihîstin, û hatin hesp dîtin. Di demeke kurt de navûdengê hespê gihaşt Iran û Turanê. Herkesî li gora xwe rewşa Ehmed û çûkê dewletê û ku hatibû xwe li ser serê Ehmed danîbû, şîrove 15

dikir. Hinekan ev tişt bi başî şîrove dikirin, hinên din jî bi Piştî li desta jêrîn, li Qerakilisê, Gîhadîn û Ixdirê Begên Kurd bihîstin û hatin dîtina hespê. Xweziya xwe bi bextê Ehmed anîn. Demeke dirêj ji xwedîyê hespê deng derneket. Ehmed, hogirên xwe li dora xwe dicivandin, suwarê hespê xwe dibûn ji bo talanê diçûn îranê, talan dianîn. Te mal bigota, mîh û hesp bigota, hemî tist dianîn, çiyayê Agirî. Le Ehmed di gumanan de bû. Xwediyê vî hespê kî bibû na jî de rojekê derketana. Gelo ew kî bû? Dibe ku mîrekî çavbixwîn û serhisjk bû. Dibe jî yekî tirsok û bêkerî bû. Di ser re şeş meh derbas bûbûn. Êdî Ehmed, tirs, şik û kêfa xwe ji bîr kiribûn.

Rojekê, serê sibê, dema ku rojê tîrêjên xwe en tûj bera ser Agirî dabû, Sofî gopalê xwe li erdê dixist, rîha wî ya sipî û dirêj dilêrizî, û dihat nik Ehmed.

Sofî pirsî: "Te bihistiye."

"Paşayê Beyazidê Mehmûd Xan, li hespê xwe digêre".

Ehmed got: "Belê min bihistîye".

"Kî hespê ji pasê re bibe, pasa de ji wî re pêne hespên kihêl û pêncî zêran bide."

Ehmed "Belê" got.

"Ew, hespê li mala kê û di destê kê de bigire de serê wî jêbike."

Ehmed got: "Ew ci bikin, hesp qismetê min e".

"Ew de ordiya xwe bigire û were ser me".

"Hesp qismetê min e".

"Mahmût Xan paşakî zordest e."

"Hesp qismetê min e"

Meriv bi Mahmût Xan re nikare qayişê biksme".

"Hesp ji min re diyariya xwedê ye."

"Mahmût Xan nizane maf û diyarî ci ye. Ew bûye Osma-  
16

m .

"Hesp diyariya min e".

Di ser re mehek derbas bûbû, ne bûbû peyayên Mahmût Xan hatin mala Ehmed. gotin:

"Paşa dibêje." "Ci dixwaze bera bixwaze, ji mal, ji père ci hildiçîne bera hilçîne, le bera hespê min bide. Mafir hespê min reviyaye, çûye ber deriyê wî rawestîyaye, ew ci bixwaze, ez de bidimê."

Ehmed: "Ma xan nizane ku hesp ji min re diyarî ye. Hes pê ku diyarî bûye, ji kesekî re nayê dayîn. Serî têt dayîn le hesp nayê dayîn. Ma paşa vî nizanê?"

"Paşa vê dizane, le dîsa jî hespê xwe dixwaze. Ev hesp ji





Ehmed ne bi tena xwe bû.

Paşê ji hemî begên Kurd en ku dostên wî bûn û wî nedigikandin, gazî bir. Begên Wanê, Patnosê, çiyayê Suphanê, Mûşê û Bêtlisê. Hemî beg li hespên xweşik suwar bûn û hatin. Mehmût Xan bi rumeteke mezin ew hewandin. Mêvanên xwe, bi rumeteke ku heya nuha li cîkî din ne dîtibûn hewandin. Piştî, civat gerand û bobîlata ku hatibû serê wî ji wan re got:

Mahmût Xan digot:

"Yekî çiyayî, rêbir û zarokê doh hespê min dizî û tigtên bê rê anîn serê min".

Kesekî ji wan nikaribû manayê diyariyê bi paşê bidana fêhm kirin. Newêrbûn bibêjin ku, serê hemî mirovên çiyayê Agirî dikare bête birîn le ew hesp carekê din bi paşde venagere. Her bédeng man. Her ku begên Kurd bédeng man, paşa jî hîn pirtir bêhteng bû, dawiyê gotina xwe girêda û got:

"Wî hespê ji we dixwazim."

Begên Kurd bê dilê xwe ji Ehmed û mirovên çiyayê Agirî re qasid gandin. Ehmed hesp neda wan jî. Tevî nedana hespê hin gotinên giran jî ji wan re bi rêkir û got.

"Ma ew nizanin ev hesp dîyarî hatiye û li ber derî rawestiyaye. Hespê ku se caran ji malê hatibe dîrxistin û hersê caran jî vegeryabe, ji kesekî re nayê dayîn. Ev hesp ne ê min e, ev hesp hatiye serê çiyayê Agirî. Ev qismeta çiyayê Agirî ye. Ew en ku beg in, çawa dikarin û çawa zimanê wan digêre hespê me bixwazin? Ew ne beg in, ew koleyê page

18

ne.

Begên Kurd bi van gotinên Ehmed ne êgîyan û dilteng nebûn. Gotin, xelkên çiyayî rast dibêjin. Le çara tunebû.

Page de ji bo hespê xwe hemî tigtî bikirana.

Gava page ji begên Kurd bersîveke erênî negirt, xwe ji bo êrîgê amade kir. Legker civand, begên Kurd jî girtin nik xwe û berê xwe da çiyayê Agirî.

Dem payiz bû, kuntara çiyayê Agirî mîna êgir digewitî.

Zinarên sor, û mor, kevirê axa bej ê pûç di bin nalên hespan de mîna avê bi xugexûg diherikîn. Rojekê ber êvarê gîhagtin gundê Ehmed, Sorikê. Gund vîkî vala bû. Canek jî li gund tunebû. Li gund rawestiyan. Page, ji bo gewitandina gund ferman da û agir berdanê gund. Ji nav malên ku digewitîn kalekî ku rîha wî bi tenî regbuyî derket. Birûyên wî en dirêj çavên wî vegartîbûn, gai û çapikekî pir nûh bi tayê gîn neqigkirî li xwe kiribû. Derket pêgberî page. Ew mêrik Sofî bû. Bi awirên tûj tûj li page nêrî. Çavên wî en qertelî wek brûskê pêdiketin. Kal got:

"Paga ew tigt hemî ji bo hespekî ye?" û domand "Ji roja ku cîhan bûye cîhan, kê hespê ku hatiye li ber deriyê wî rawestîyaye bi pagde vegerandiye? Ma tu vê nizanî paga? Tu

20

bûyî Osmanî? Ana na ji bo hespekî, te ev tigt ne dianîn serê me, me ne digewitandin û wêran nedikirin. Nalet û xezeba Agirî li serê te be page. Ez bavê te dinasim. Ew begekî mêt bû. Tu bûyî paga. Te xwe ji bîra kir paga. Bavê te hespê diyarî ji kesekî nedixwest. Heger hesp biçûna ber deriyê jinebîyekê, zarokekî yan, dizek û xizanekî rawestiya,

dîsa jî ji wan nedixwest. Bavé te beg bû. Tu bûyî  
paga. Xwelîyê Agirî li serê te be."

Paga bersîv neda hew got:

"Destên wî girêbidin, lalekê derbasî hustyê wî bikin û wî  
bavêjin zîndanê."

Li kuntar û biné çiyayê Agirî pir gund hebûn Mehmût  
xan, begên Kurd, peyayên begên Kurd û legkerên Mehmût  
Xan gund bi gund digerîyan. Digihagtin kîjan gundî, gund  
vala dîditîn. Mirov digot qey lingên mirovan bi van gundan  
nebûye. Page her ku gundekîvala didît, har dibû û digot:  
"Ala serhildanê vekirine" û kef bi devê wî diket.

Paga mervekî pir dirêj bû. Rîha wî reş û xelek xelekî bû.  
Pozê wî wek dimikê qertelê nikilxwar, çavên wî reg bûn. Ji  
her rewg, helwest û peyiva wî, ji hejandina destên wî, bi  
xwe bawerbûnek diyar dibû. Pir kêr dipeyivî û her diramiya.  
Bi gavên xwe en dirêj wek kabûsekî dimegiya. Di nav  
kurkên samûr de her xwedan dida.

Ji degta Ixdirê derbasî Bagkôy bûn. Newala Ahûrî derbas  
bûn, çûn degta Ahûrê. Rastî kesekî, givanek, rêwîyek û rêberekî  
jî nehatin. Heya rastê tebayekî bican hirc, rêwî û pilingekî  
jî ne hatin. Weke ku cîhan nuh saz dibû. Vizîna  
mêgan jî nedihate bihîstin.

Page bi hêrs got: "Ez de wan peyda bikim. Heger zemîn  
vebûbe, ketibinê jî, ez de wan derxînim. Birevin aliyê cihanê  
din jî ezê wan bibînim. Çûbin îran, Hînd, Çîn û Maçînê  
jî ez ê wan bibînim.

Begên Kurd, devên xwe venekirin. Hemî weke ku lai bû-

bûn.

Zivistan hat. Êdî ew, hespên wan û legkerên wan westiyabûn.

Li çarmedora Agirî dog bûbûn, hatibûn kuntara

Agirîyê biçûk. Page ji hal ketibû û rengê wî zer bûbû. Ji

ber ku rastî tigtekî bican nehatibûn, dîn bûbû. Êdî nema ji

kesekî re tigtek digot û nedipeyivî. En ku bi wî re bûn, dixwestin

ji helwestên wî bizanibin ka paga ci dixwaze, û bêhêvî,

bêrawestîn li dora Agirî digerîyan.

Ji begên Kurd Melle Kerîm, hat nik page û je re got:

"Page em ji nuha hezar salan li vî çiyayê Gîrîdê bigerin,

nikarin kesekî peyde bikin. Ew çiyayê dema xwe vegêrin

xwe usa vedigêrin ku geytan jî nikare wan bibîne.

Xwelî li serê min".

Page bi çavên xwe en xemgîn le nêrî, le tigtek negot.

Li Agirîyê lêgerîna xwe berdewam kirin. Paga diramiya û

di dilê xwe de digot: Ez ji vî Sofîyî pêve, ji van çiyayîyan

yekî bivînim, têra min dike.

Dawîyê begên Kurd di nav xwe de civîyan. Ev kar de bigîhigtana

ku? Bigere, bigere, de ci bibûna? Page jî tigtek

fêm nedikir. Dema gundên vala didîtin, dibû weke dînan.

Vê rewgê de usa berdewam nekirana. Ji xwe nikaribûn ji

vê zêdetir li Agirî bigeryana. Babazokî xurt û agîtekê dikaribû

wan hemîyan bikûje. Ji xwe begên Kurd ji page re ev

rewg gotibûn. Le page guh nedabû wan. Begên Kurd li ser

vê rewgê dûrûdirêj peyivîn. Dawiyê biryar dan ku ji page re

pêgneyarîyekê bibin.

Mêle Kerîm, li pêgberî page dest û milên xwe girêda bi

ryar began ji page re got:

"Pagayê min, em civiyan û me biryar girt. Di nav sê-çar mehan de, berî bihar û havînê em de Ehmed û hespê pey de bikin û bînin.

Page got: "Derdê min ne Ehmed e ne jî hesp. Ev çend çiyayî çûn ku? Ji Sofî pêve me kesek li ew çend gundên 22

çiyê nedît. Me merûyek jî peyde nekir. Beriya biharê û beriya helîna berfê ez gundiyan jî dixwazim.

Beg di navbera xwe da dîsa civiyan û li ser rewgê dur û dirêj axaftin. Carake din Mêle Kerîm hat nik page û got.

"Belê, begê min. Berî destpêka biharê em de gundiyan jî, ji te re bînin. Ew reviya bin, çûbin kîjan aliyê cihanê jî em dé wan peyda bikin".

Û vegeryan seraya Beyazîdê. Page carekê din civat gerand ji her begî re cihê cihê bertîlên hêja dan. Ji vî helwesta page hemî begên Kurd dilgah bûbûn. Le wan de çawa Ehmed peyda bikirana? Dema çiyayîyan, bixwestana xwe vegartana, dikaribûn heya roja qiyametê xwe biparêzin.

Paga mirovekî pir xwenda bû. Bi Osmanîya û bi ganê Osmaniyan ve girêdayî bû. Bapîrê, bapîrê, bapîrê wî jî ji vî

çiyayî bûn. Page nizanîbû kalên wî kengî ji wî çiyayî daketine jêr. Tenê dizanibû, pigtî ku bavê wî xwendina xwe li dibistana Erzurumê tamam kiribû, çûbû Istanbulê li serayê

ma bû. Pigtre ew bi rutbeya pagatîyê gandibûn Beyazîdê.

Bavê wî yaman bû. Merivekî wek qertelan bû. Li Beyazîdê,

li ser wan zinaran ew seraya mezin dabû avakirin. Çûqas

kesên zaniyar, dengbêj û hozan hebûn li seraya xwe dihewandin.

Begên Kurd en Qersê, heya Wanê, ê ji Wanê heya

Erzurumê, ji page ditirsiyan. Bavé wî demeke dirêj jiyabû. Heya bi gava mirina xwe ji ser hespê daneketibû. Havînan diçû zozanên xwe yen Agirî. Konê xwe yê mezin ê ku ji se rayê bêhtir rûmet didayê li rastekî fireh vedigirt. Degta ku konê xwe le vedigirt, dest pêka qega çiyê bû. Çiyayîyan pir rûmet didan bavé wî. Dibe ku ji tirsan...Bavê wî jî rûmet dida çiyayîyan li gor toreyên wan dimegiyan. Dihat bîra Mehmût Xan ku bavé wî çel-pêncî bilûrvan li hev dicivandin û di çadira xwe de li wan guhdarî dikir. Heger hespekî bavé wî bi vî awayî bireviyana û biçûna li devê merivekî wek Ehmed rawestiyana, gelo de hesp lé vegerandana? û

24  
heger pagde nezivirandana de bavé wî ci bikirana?

Mehmût Xan ev tigt ji hev dervedixistin.

Van Begên Kurd de çawa kesên çiyayî peyde bikirana?.

Yan, heger pir dur çûbûn û gihagtibin îranê, Xorasanê yan heger pigta xwe sipartibin çiyayê Qafqasê? Began dé çawa ew peyda bikirana?

Page jî wek bavé xwe pêgî li Erzurumê xwendiyê, pigtre çûye Istanbulê, li serayê maye û xwe bi wan dabû qebûl kirin.

Bi Ordiya padigah re begdarî geran kiriye. Bi mêranî, jêhatibûna xwe nav dabû. Çûye şamê, Helebê û Qahirê. Li wan deran demekî maye. Sofîya û Delî orman jî dîtibû. Li Rojhilat û Roava bag geriyabû. Berî mirina bavé xwe, bi 12 salan hatiye Beyazidê. Li seraya bavé xwe bicîh bûye. Dema bavé wî rnişîye, cihê bavé xwe girtiye. Bavé wî xwestibû ew were Beyazidê, yan na wî îstanbul bernadida û ne diçû cîhekî din.

Pêgî, bi mirovên vir en hovane û bi van çiyayîyan neguncîya.  
Tevî ku sarayeke wek a Beyazîdê li îstanbolê tunebû,  
lé her tigt bi sarayê tenê neqediya... A duyim jî jinên van  
çiyayîyan pir xwegik dibûn. Mirov li tu cîhê cîhanê nikaribû  
wek jinên vir narîn bidîtana. Mehmût Xan, pêgî keçeke  
Ermenî anî. Pigtre keça begekî Kurd anî. Jina xwe ya sisîyan  
ji Qafqasan anî. Jina wîya çaran ji dora gola Urmiye bû.  
Se keç û hegt lawên wî çêbûn. Pêne birayên wî jî hebûn.  
Merivên wî û êla wî li degta Ixdirê bi cîh bûbûn. Pêwendiyên  
Mehmût Xan ew çend bi wan re tunebûn. Bi çavekî  
biçûker li wan dinêrî. Birayê wî yê herî biçûk dev ji serayê  
berdabû û çûbû degta Ixdirê. Li Ixdirê ji nav êla xwe ji xwe  
re jinek anîbû. Li wir bicîh bûbû û nema vegeryabû sarayê.  
Ji birayê xwe dilteng bûbû.

Meraqa page a mezin nêçîra pezkoviyan bû. Hersai  
biharê, derbên bag digirtin nik xwe, ji bo nêçîra pezko  
viyan diçû çiyayê Esrûkê ê ku li jora Gola Wanê bû, diçû  
25

geliyê sor û zîl. Derdiket çiyayî Suphanê, bi sedan postê  
pezkoviyan bi xwe re dianîn û vedigeriya.

Navê keçek page Gulistan, navê a didûyan Gulriz û a sisiyan  
jî Gulbahar bû. Diya Gulistanê Ermenî bû. Bejna  
Gulistanê zirav û dirêj bû. Pore wî sor, çavên wî girs û  
qehweyî bûn. Mijankên wê dirêj bûn, cilên wî ji îstanbolê  
dihatin. Wek keça serayê li xwe dikir. Pore Gulrîzê kej bû,  
qirik dirêj, mijank xelekî û çavgîn bû. Wî jî wek xwigka xwe  
cilên xwe ji Istanbolê dida anîn. Gulrîzê ji hemî xwigkên  
xwe bêhtir bala xwe dida xwendinê. Helbestên Ehmedê

Xanê jiber kiribû. Gulrîz hîndi zaroktiya xwe da, diçû oda bavé xwe û ji wî re helbest dixwendin. Bavé wê jî hemû zarokên xwe pirtir hez ji Gulrîzê dikir.

Gulbahar ne kin ne dirêj bû, dagirtî bû. Genimgûnî bû. Tenê wê mat bû. Li xwigkên xwe ne hatibû. Wekî jinên çiyayê Agirî, fîstanên qatqat li xwe dikir. Pore xwe dihona, dikir, çel kezî. Gerdanlixa wê zêr bû. Wê jî wek jinên çiyayî Agirî payanên zêr, încî, zumrût dixistin lingên xwe. Pir bi aqil bû. Hindik dipeyvî û nerm dikeniya xwigk û birayên wê en mayî kêr daran ji serayê derdiketin û diçûn nav xelkê. Le Gulbahar ne waha bû, ew her dem di nav xelkê de bû. Hez ji çûyin-hatinê dikir. Ji dawet, mêvanî û gînayîyan bi gûnde ne dima.

Xelkê bajarê Beyazidê û gundiyan çiyayê Agirî ji Gulbaharê pir hez dikirin. Bi çavên pêrîzadekê li wê dinêrîn. Li ku derê, nexwegek, kalek, pîrek yan jî hejarek hebûna Gulbahar li nik wan bû. Ji suwariyekî ûsta hîn çêtir li hes pê siwar dibû. Ê Paga ji dur ve çavdariya keça xwe dikir; têkîlê wê nedibû. Di dilê xwe de digot, heger ev keç law bûna de bibûna padigahê çiyayê Agirî.

Gulbaharê qet hez ji serayê nedikir. Bi xwigk û birayên xwe re jî nedigunciya.

Gundîyan tu daran bi navê wê bang ne dikirênê. Ji wê re 26

digotin; keça devken. Dema dikeniya, hinarkên wê diketin kortê. Çavên wê en germ û xemgîn bi hesreta daxwazeke dur diçirisîn, îsal nûh ketibû bîst û duduyan.

Di sarayê de Gulbahar ji herkesî pirtir bi doza hespê



bavé xwe bendewar bûbû. Vî hespê tigtek vedigart. Gulbaharê çîroka hespê ji devê Sofî bihîstibû û ji Sofî pir hez ki ribû. Heroj bidestên xwe ji bo Sofî xwarin dibir zîndanê û ji wî tigt dipirsîn.

Sofî digot: "Wellehî gîrîna min rast e. Min bi destên xwe se caran ew hespê bir jêr û min ew bera rê da. Hesp her se caran jî vegeriya, hat li ber deriyê Ehmed rawestiya. Ev hesp, diyariya Ehmed e. Xwedê ew ji Ehmed re diyarî gandiye. Ehmed nema dikare wî hespê bide hinekan. Heger bide nabe. Hemû kesên çiyayî dikarin bimirin, le wî hespê pagde nadin.

Rojekê Sofî ji Gulbaharê bilûrek xwest. Gulbaharê, hemaje re bilûrekê pir kevin, dibe ku bilûrekê sed salî anî, dayê. Gulbahar ji vê daxwaza wî re gag ma. Sofî de çawa bi vê pîrbûna xwe li bilûrê bixistana? Ji bo lêxistina bilûrê divê diran û hilma mirovan bag be. Hew xort tenê dikarin, xweg li bilûrê bixin. Gulbaharê bala xwe dayê ku diranên wî kalê pigtexûz hemî saxlam in û sipê dikin.

Sofî çawa bilûr girt destên xwe dest bi lêdanê kir. Gulbaharê ji dengê bilûrê sermest bûbû. Hêdîka li ber deriyê zîndanê rûnigt, pigda xwe da hêta dîwêr. Sofî lêxist wê guhdarî kir. Kerba Sofî rabûbû, ne west dihat bîra wî, ne jî rawest. Her lêdixist.

Dema dengê bilûrê hâte birîn, Gulbahar weke ku ji xewneke kûr gîyar bûbe, hîgiyar bû. Bi dengêkî pir nizm pirsî:

"Sofî ev strana kê ye?"

Sofî gotê: "Ev strana bîntengiya Çiyayê Agirî ye. Wextekî Agirî pir hêrs bûye, pigtre bav û kalên me, li ser hêrsa Agi

rî ev stran gotine."

27

Gulbahar heroj bi berbangê sibê re dihat ber pencar Sofî. Sofî jî heroj li wê stranî dixist. Gulbaharê ci dikir û çend dipirsî, Sofî ji wê re bi devkî çîroka Agirî nedigot.

Hoya vê xezabê ji wê re ne digot. Her digot:

"Hema, ji xwe hatiye xezabê". "Ew xeyidî ye, bavûkalên me jî li ser vê xeyda wî stran çêkirine. Ez hew dizanim bi bilûrê U wê destanê bixim. Ez ne dengbêj im. Gotinên vê stranê dengbêj dizanin. Ez bilûrvan im, ez ne dengbêj im. Gulbaharê, çiqas xwest ji Sofî rastiya çîroka Agirî fêr bibe, le bi serneket.

Sofî ji Gulbaharê re digot:

"Sultana min! qey bilûra min nikare te serwextî serpêhatiya vê xezabê bike. Wey xwelî li serê min. Xûya ye ez pir kal bûme".

Gulbaharê li van çiyayan, ev strana navdar ji devê gundî, jin, zarok, dengbêj û bilûrvanan pir bihistibû. Le wek a Sofî ne bihistibû. Heger, wî ev xezab bigotana xwedê dizane de çawa bigota?

Page ji dur ve çavdariya keça xwe dikir û dizanibû ku keça wî bi Sofî re bendewar e. Ji wî re xwarinê digîne û bilûra wî guhdarî dike.

Rojekê Sofî anî nik xwe û got:

"Sofî, heya Ehmed û hesp neyên ez te ji zîndanê bernadim. Dixwazî hêre Ehmed û hespê bîne".

Sofî bi hêrs gotê:

"Hesp jî, Ehmed jî de neyên ber te. Ev hesp ji Ehmed re

diyariya xwedê ye. Dibe ku Ehmed were, le hesp nayê. Ez jî, ji te re nayînim."

Paga pir aciz bû. Sofî pagde gand zîndanê. Bangî Gulba harê kir û got: "Gulbahar" carekê din têkilîya xwe bi Sofî re daneynî."

Di sarayê de her gotina page ferman e.

Pigtî çend rojan ji begên êla Heyderan nûçevan hat, di-  
29

got: "Bera paga meraq neke. Me cîhê hesp, Ehmed û çiyayîyan peyde kir. Di nêzîk de hesp û Ehmed de bigiyên destên wî".

Ehmed hemî çiyayî komkiribûn û çûbû jêr, Haqarîyê.  
Nik Kurdên şemdînan.

Beg kom bûn û lawê Begê Milan gandin şemdînan.

Lawê begê Milan, Mûsa Beg, li jora çiyê li degtekê, di nav konên zêde de, konê Ehmed û ku bi mar neqigandîbû, dît.  
Ehmed li wir bû.

Ehmed bi dil û can, bi rumetdaneke mezin, pêrginiya wî kir. Mûsa Beg, tigtên ku çêbûne ji Ehmed re gotin û domand.

"Paga dixwaze te bibîne," "ji te tigtekî din naxwaze. Hes pê jî naxwaze. Paga dixwaze gundî vegerin, Agirî. Began jî bo efûkirina te û gundiyan, ji page tika kirine. Paga tenê te meraq dike. Dibêje, ew Ehmed merivekî çawa ye? Page ji begên me re gotiye; bera çavên min wî mêrxasî bibînin, ez je panzdeh hespên din jî bidimê. Tenê bi çavê xwegiyê, mêrxasêkî welê bibînim. Began ew gotin ji min re gotin û ez gandim nik te".

Begên şemdînan, pêgkegên Agirîyê, beg û axa li hev çiviyan.

Dur û dirêj raberizîn, Hinan digotin ev dek e. Hinên din digotin, evçend begên mîna gêran ji bo pêkanîna dekeke waha, ma xwe biçûk dikin?

Pagakî Osmanî û ew çend begên, ma dikarin, ji bo hespekî welê, xwe biçûk bikin? Xûya bû, paga xwestibû Ehmed bibîne. Meraq fikir ku ka hespê wî çûye li ber de riyê kê rawestiyaye.

Ehmed, ji Mûsa Beg bihist ku Sofî di zîndanê de ye. Pir li ber Sofî ket. Dema dev ji çiyê berdabûn û çûbûn, Ehmed pir li ber Sofî geriyabû, le Sofî ji çiyê dur nexistibû. Sofî, mîna zinarê ku xwe bi çiyê bigire, xwe bi çiyê ve zeliqandibû, wî ci dizanibû ku paga de wî bavîje zîndanê.

30

Mûsa Beg got: "Meraq nekin karê Sofî bag e." û dostenîya Sofî û Gulbahar xanim got. Hemî bi vî yekê ga bûn."

Ehmed got: "Mûsa beg" "Mafir tu hatiyî ez xatirê te nagkînim. Ez de vegerim Agirî û herim nik page, êl de jî vegere. Le belê paga carekê din rûyê hespê nabîne".

Mûsa Beg carekê din gotina xwe got:

"Paga dixwaze, te bibîne, tenê dixwaze te bibîne."

Û di rojekê biharê de çiyayî vegeriyan Agirî.

Hemî begên Kurd bi hev re Ehmed girtin nik xwe û hatin sarayê. Page bê diltengî û bi çavekî biçûker, pêrgîniya

Ehmed kir û got: "Were siltanê Agirî, ka hesp li ku ye?"

Ehmed got: "Hesp li mala min e".

Page bi ken got: 'Te hespê min dizî, ma tu dizanî cezayî dizîna hespê jî ci ye?

Ehmed qet pagde venekigiya û got:

"Min hespê te ne dizîye xwedê ew hespî diyarî daye min. Hesp nema ji te re tête dan. Bavûkalên te jî ji vî çiyayî ne. Ma tu bi vê torayê nizanî?"

Dema page ew bersîv girt, har bû:

"Ez nizanim yan tu de hespê min bînî yan jî ezê serê te jêkim. Vî bavêjin zîndanê."

Begên ku Ehmed anîbûn bêdeng man.

Ehmed di çûyina xwe de bang kir û got: "Page, paga, serê min biçe jî tu wî hespê nabînî. Ew carekê din nayê saraya te".

Mûsa beg ew hêvî ne dikir. Ji lew re dij derket û got:

"Paga, ev tigtên ku hûn dikin, ne mirovî ye. Min, Ehmed girt anî, ne tu bavêjî zîndanê. We derew kir û em xapandin".

Paga qîrya û ferman da: "Vî jî bavêjin zîndanê".

Mûsa beg birin zîndanê.

Paga vegeriya ser begên Kurd:

'Tigtê ku we de ji min re bikirana ma ev bû? Hespê min li ku ye? Ehmed hat. Hespê min li ku ye? Ez hespê xwe  
31

dixwazim. Ez vê lekeyî nayinim ser malbata xwe. Ez nahêlim ku xelk bibêje, paga nikaribû hespê xwe ji yekî çiyayî bistîne".

Gotin: "Dijwar e, le em de hespê jî bînin."

Serpêhatiya hespê, Ehmed, Sofî, û Mûsa Beg, ji Wanê heya Melatyayê, ji Melatyê heya Qafqasan, ji wir jî heya nav Enedolê belav bû. Dengbêjan li ser Ehmed û li ser hespê stran çêkirin û li hemî cîhê ev stran gotin:

Çiyayî bi vê deke pir êgiyan. Ew dek bi êla Milan jî ne

xweg hat.

Dema Mûsa Beg çû zîndanê ket destê Ehmed û got:

"Li min megire, min nizanibû. Min biborîne, yan na min tu nedianî. Heya, serê min jênebe ê te jênabe."

Sofî bi hatina Ehmed pir ga bû. Ew hembêz kir. Pigtire rahigt bilûra xwe û dest bi lêdana çîroka Agirî kir. Lêxist, lêxist... ji çavên Mûsa Beg û Ehmed, hêsirk bariyan. Ji lêdana bilûrê ter bû îcar bilûr da Ehmed. Dilê Ehmed digewitî. Ehmed di dil xwe de digot, hêvîya min ji xwedê heye ku laneta Agirî li serê paga û serê began bibare û li bilûrê xist. Bilûr bi awakî nuh û bi dengekî nuh hatibû zimên. Gulbahar ev dengê nuh bihîst, ev denga ne wekî ê din bû. Wêjî çîroka Agirî digot. Digot, le dilê çiyê, zinar û keviran pê digewitî. Zinar û çiya diheland.

Gulbahar hat zîndanê. Ji bavê xwe jî ditirsiya. Lé ci dibû bera bibûna diviya xwediyê vê hunera bêpayan bidîtana. Bi mahna dîtina Sofî hat Ehmedê bilûrvan dît. Di dilê wê de daxwazeke germ û dostane ku berê pê re çênebûbû derbas bû. Ji kira bavê xwe dîn bûbû. Li ber dîwer rûnigt û li bilûra Ehmed guhdarî kir, sermest bû. Diviya tigtekî bike. Hin tigt. Tigtekî ku ne miroviya bavê wê bidana ji bîr kirin. Mêraniya Mûsa Beg jî ew dilxweg kiribû.

Wê rojê Gulbahar ket agpêgxa, bi jinên karker en ku ji wê hez dikirin, xwarinên pir xweg çêkirin û bi peyayên xwe

32  
re gand zîndanê. Diya wê ew tigt bihîst û gotê:

"Paga vê kira te bibihîse, serê me hemiyan de bide jêkinn. Gulbahar bersîva wê da.

"Pigtî ku page ev çend xwe biçûk kirîye, êdî ci dixwaze bike, bira bike."

Roj derbas dibûn. Begên Kurd ne dikaribûn hespê pey da bikin û bînin ne jî dikaribûn xeberekê rê bikin. Mûsa Beg û Ehmed jî li zîndanê bûn. Gulbahar bi dizî ji wan re xwarin digand, carna jî diçû zîndanê, ji dur ve çavdariyê wan dikir.

Rojekê xwe nema girt û ji Sofî re got:

"Divê ez bi Ehmed re biaxifim. Ji Ehmed re bibêje, ez de gevekê werim zîndanê."

Rîha Ehmed a zerê zêrinê xelek xelekî û dirêj bû. Mijankên wî en dirêj ji çavên wî en gîn re, regekî xemgînî û kildar didan. Ehmed bejin dirêj bû. Pore wî ê xelek xelekî diket seranîya wî. Rûyê wî ê zirav û dirêj rengê rûyê pezkovîyeke birîndar û xemgînî dida. Mirov digot qey hemî êg, daxwaz û hêviyên mirovan di wî rûyî de civiyabûn û rûyê wî di nav xewneke avsînî de wenda bûbû. Di nêrîn û sekina wî de tama agirê cîhaneke nependî hebû, ku kê ew bidîtana xwîna wî de bi Ehmed bikeliya, fena ku Gulbahar ji pir mêj ve Ehmed dinasî. Weke ku bi hev re çêbûne û bi hev re mezin bûne. Ew çend xwîna wê bi Ehmed dikeliya... Dibe li dawet, gahî, zozan û nêçîran... dibe ku, di xewn û xeyala xwe de dîtibû... Ewende nas, ewende dost bû. Sofî got: "Ezbenî de çawa be? Ma dergevanê zîndanê destûr dide? Di ji page re bibêje, ew de jî serê me hemiyan bide jêkirin."

Dilê Gulbaharê digewitî û ranediwestiya. Êdî xewa gevê wenda, kiribû. Rûyê Ehmed mina rohnayîyeke zer dihat

ber çavên wê û diçû. Dikeniya di çavên wî en girs û çîn de  
33

kulên herî giran û bêçare diyar dibûn. Diviya derd û kulekî  
Ehmed ê mizin heba. Derdekî bêderman... Dibe ku kesekî  
wî, de, bav, bira û delaliya wî tunebû. Weke ku di wê cîhana  
mezin de bi tena xwe û sêwî mabû. Tenê, tipûtenê.

Gulbahar dema waha diramiya êgeke pir dijwar diket dilê  
wê. Bêrawest di dilê xwe de digot, divê bipeyivim û ji tenê  
bûna wî û kulê wî ne bibim derman. Rebeno bi ser de jî di  
zîndanê de ye.

Çima ew her di hegê wî de bû? Ji bo ci ew dihat ber çavên  
wê? Di xewn û xeyala wê de her ew hebû. Li ci dinêrî  
Ehmed li ber çavên wê bû. Destên xwe dida kê û dida ci,  
digot qey berê destên xwe dide Ehmed. Bi xwe sey bûbû.  
Diçû ku, dilê wî ew berbi zîndanê ve dikigand. Gulbaharê  
çend caran zîndan dîtibû. Derîyê zîndan ji hesinekî giran û  
pir mezin bû. Kilîta wî a bi zincîr û pir mezin pêve bû. Doraliya  
derî ji kevirên gikandiyên saxlam çêkiribûn û kevir  
xirxire je bûbû.

Dergevanê zîndanê Mémo bû, merivekî ku bavê Gulbaharê  
pir pê bawer bû. Bi qasî zarokên xwe je hez dikir.  
Bavê Mémo jî, merivekî ku bi sarayê ve girêdayî bûye û  
yek ji mêrxastirîn peyayên sarayê bûye. Hîn dema ku  
Mémo du salî bûye, bavê wî di gerekî de hatiye kugtin.  
Mémo xort û pirî mên bû. Çavên xwe ji mirinê ne dida  
alî... Merivek bû ku, dikaribû ji bo page cane xwe bidana.  
Ji xwe dergevanên zîndanê herdem ji mirovên îsa dihatin  
hilçinandin. Mémo bi kesekî re nedipeyivî. Gava kesekî jî



wî re tigtek digot, mîna keçan sor dibû. Ji dema ku xwe naskir û bi gûnde ne dihat bîra Gulbaharê ku rojekê Mémo li çav û rûyê wê nêrîbe. Çuqas çavên wî li Gulbaharê diketin, sor dibû levên wî mor dibûn, xwîna wî dimiçiqî, dest û lingên wî dihejiyan. Gulbaharê herdem ev tigt bi germezariya Mémo ve girêdida. Wê herdem dîtibû ku Mémo li erdê dinêre. Mîna keçek germok sor dibe û yekcar napeyive.

34

Agpêgxanêya sarayê bi dizîkan ji zîndanê re dixebitî. Ji Mémo re jî xwarinên xweg dihatin gandin. Gulbahar hercar ji Mémo re digot:

"Birayî Mémo, min ev xwarin bi destên xwe ji te re çêkiriye."

Bi wî awayî roj derbas bûn. Gulbaharê du-sê carên din bi saya serê Mémo, ji dur ve rûyê Ehmed dît. Carcaran Mémo deriyê zîndanê vekirî dihîgt û diçû. Gulbahar jî li ser pêlikên zîndanê en hevîrîn, bi mahna ku Sofî re bipeyive, dîdît ku di binê zîndana kûr de Ehmed dimege. Ehmed, xweg piyasa dikir. Wekî çiyakî, hêdî, bi heybet, bi mêrane û bi xwebawer gav diavêtin.

Ji jora zîndanê, ji çend pencereyên zirav û dirêj, bi qasî bi bostekî rohnî digiya binê zîndanê. Cala zîndanê li ser zinarekî bilind bû. Li jêr degta Beyazîdê û riya degtê a mezin ji alîkî heya alîyê din dirêj dibû.

Hin caran dengê zengilên kerwanên ku bi ré de diçûn, digihigtin heya binê zîndanê û ji wir jî diçûn zinarê ku cala zîndanê li ser bû, deng vedidan. Hemû deng ku ji çiyê û ji degtê dihatin, jî digihagtin vî gelîyî û vedidan. Di bin çalê de bi qasî mezinahiya destekî û bejna merivekî qulek

hebû. Kesekî ku ew qui nizanîbû û nebihistîbû, nemabû. Ji lew re herkesî serekhostayê sarayê bi bagî yad fikir û herkesî , ew wek gêx dihesiband. Him jî, hoste yekî Suryan bû.

Ew bixwe di zîndanên de pir raza bûye. Kêm kesan wekî wî derdê tarîtiya zîndanê bag zanibûye. Ji lew re gotîye, ci dibe bera bibe, ezê ji vê zîndanê re qulekê çawan bihêlim. Ci dibe bera bibe, di cîhanê de cara pêgîn zîndanê ku ez ava dikim, de bi rohnî be û yek kesê zordest de nikaribe qulên van rohnayîyan en ku ez çêdikim, bigire û rohniyê vemirîne...

Pigtî ku avaniya sarayê tamam bûbû, hoste, ji page re nameyek hîgtibû û ji ber çavan wenda bûbû. Di namê de di-

36

got. "Kî wan qulan bigire, ew de vê sarayê, ji binî hilwegîne. Min ev saray li ser rohnayîya van qulan ava kirîye. Kî bixwaze wan bigire, hemî derd û belayên cîhanê de bi ser wî de bibarin. Soy û zarokên wî de ifleh nebin. Kî ku vê nameya min, negihêne destên rûnigtevanên vê sarayê de kurdende biçe."

Ji roja avabûna wê sarayê, heya nuha, kesekî newêrîbû dest bi wan qulên han bide. Ji lew re ev zîndana Beyazîdê li ser zimanê hemiyar bûbû destan. Heya nuha kî ketibû wê zîndanê ji hoste Silêmanê Suryanî re duayên bag kiribûn. Mirov dema ji wan qulan binêriyanan zivistan bûna yan jî havîn, cîhan bi awakî din diyar dibû. Ji wan qulan riyên degtên qorqorî, dirêj û bilind en ku berbi ezmên di rêj di bûn û çûk, berf, karwan, quling, toy, mîrov, qaz û stêrkên wê, stêrkên ku di ser mitikên pan en ku beranberê wê de

bûn, diciviya bi gev diçelqiyar bi renekî din diyar dibûn. Riyên wî û koyên wî en ku di bin ronahiya avên zirave de dog dibûn, dibûn weke degtek ku se qat ser hev de be û di navbera her se qatan de jî xêzek rohnî hebe. Her zîndanî dema ji vê zîndanê derket, li derve nikaribû xwegikayiya wan tigtên ku ji zîndanê xûya dikir, bibîne. Êdî nikaribû rengê kulilkan, berf, ronahî, û keskatiya ku hin caran dibû mor, qehwerengî û gîn û roj û zerê ku dibiriqî û cîhana ku bê rawest diguherî, bidîtana. Bi rojan li wan digeriya, le ca rekê din nedidît. Gava girtî ji zîndanê derdiket weke ku ew cîhan jî, degt jî, serê xwe digirtin û diçûn cîhekî din. Li zîndanê Sofî, Ehmed û Mûsa Beg, bi rêzê di wê qulê re li der ve, li bahara ku li hemî cîhê belav bûbû, dinêrîn. Her serê sibê ji degtê berbi çiyar qoreke mij a tenik bilind dibû. Wê mijê hêdî hêdî renekî pembe digirt, dawiyê wenda dibû.

Gulbahar, ji serî heya nenûkê lingan evîndar bûbû. Heya 37

bi hestiyên wê bi evîne tije bûbûn, destên xwe dirêjî ci di kir, bi hezkirinê dihesiya. Gulbahar di nav sarayê de weke miriyan digeriya. Bêhnekê di cîhê xwe de ranediwestiya. Carcaran, rehet û bi kêf dibû, carcaran jî diketê nav xem û kulan û bêhîvî dibû. Him dilxwegî him jî diltengiya wê zû dihat zû diçû.

Gulbahar diramîya û ji xwe re digot, dîtina min a Ehmed hew dema ku ew di zîndanê de ye, bi destê min dikeve. Dibe ku wekî dîtir ez nikaribim wî bibînim. Ne bes nikarim bibînim, nikarim vî tigtî biramim jî, ji xwe dema zîndana

Ehmed xelas be, kes nikare wî bibîne. Ne bavé Gulbaharê, ne şah û Padîşah ne jî Sêxê karwanan, dé nikaribin wî bibînin. Di vê cîhanê de ji bo hemû tigt jî çara hebû lé ji bo hevdîtina Gulbahar û Ehmed, ne ji nêzîk, ji dur ve jî, çare tunebû.

Êdî di dilê Gulbaharê de ji bo hemî tigtî, mirin, cihêbûn, zordestî, evîn û bêhêvîtiyê, hisseke negemikir peyda bûbû Hemî hissên wê serî hildabûn.

Ji nigka ve bédeng ma. Hemî aliyên lagê wê, westiyayî bû. Gogtê lagê wê weke ku di nav hawanê de hatibû kutandin. Di nav sarayê de wek nîv mirîyan diçû û dihat. En ku çav wê diketin gag diman. Bahoza Gulbaharê rawestiyabû. Se rojan bi wî awayî, bê ku bipeyive û devê xwe veke, bêlebat, bêhêvî, di nav malê de wek miriya ji gorê rabûye, diçû û dihat. Se rojan devê wê venebû. Rûyê wê westiyayî û zer bûbû. Pore wê nedibiriqî. Diranên wê sipîtiya xwe wenda kiribûn. Çavên wê en girs carcaran dibiriqîn, carcaran jî vedimirîn. Di rûyê wê de, di gîrîntirîn cîhê rûyê wê de kenekî kûr, bextiyarek û xurûrek mabû. Û lagê wê xisti bû derd û kulekî mezin.

Berbi êvarekê, rewga Gulbaharê hâte guhartin. Bahoza evînê ku di dilê wê de bû, serî hilda. Nikaribû di cihê xwe de bisekiniyana. Dîsa hezkirin û bextiyariya wê bûbû sîda-

38  
rê kevir û axê. Nema gev dibû. Digot qey gev de qet neyê. Weke ku qet, qet, qet gev de neyê... Xwe avêt derveyî sa rayê. Ji dur ve hinekî li dikkana hesinker û U çîkên ronayiyê hesinê wî temaga kir. Li hesinker nêrî. Hesinker di

nav çirûskên êgir de wenda dibû. Pigtre çû goristana Ehmedê Xanê, niyaz û daxwazên xwe ji Ehmedê Xanê re gotin, dua kirin û ji wî alîkarî xwest. Duayên wê wek lehiyê av bend û bêsinor li pey hev rêz dibûn. Dema ji goristana Ehmedê Xanê bi dûrket, ro çûbû ava. şeva tarî a ku li gor Gulbaharê pir dereng hatibû, hêdî hêdî dest bi barîne kiri bû.

Êdî aqilê Gulbaharê digihagt her tigtî. Ji bo wê hêviya rizgarbûnê nemabû. Biryara xwe dabû ku bimege ser qedera xwe. Ci dibû bera bibûna.

Di odayê Gulbaharê de sendoqeke gûz ê neqigandî hebû. Di sendoqê de gerdanlixekî qefqasî ku pîrika wê ji wê re diyarî kiribû, hebû. Gerdanlix ji zêr û yaqût çêbûbû. Weke din jî, gustîrek û hin bazinên încî, payamên hîndî en zêrîn, xizêmeke Afganî a ku xalê wî je re dabû, hebûn. Gulbaharê ji wê sandoqê, hemî tigtên xwe derxistin, xistinê nav tûrekî qedîfê. Raste rast çû zîndanê. Mémo li odaya xwe ya ku li kêleka zîndanê bû, rûnigtibû. Gulbaharê li derî xist. Mémo derî vekir. şûrê Mémo yê mezin ji kêleka wî ya rastê heya gûpka lingên wî dadiket. Ebaya wî ji çermê ciwanîyên hespan çêbûbû, û bi zîvê qefqasî neqigandîbû. Kumê wî yê kulavî di serê wî de bû. Dema çavên Mémo li Gulbaharê ket, di rûyê wî de bextiyareke bêpayan, kêfxwegiyeke pir mezin xûya bû. Ew kêfxwegî ji çavên Gulbaharê nereviya. Ji nigka ve rûyê Mémo reg qermiçi û di rûyê wî de bêhêvîtiyeke mezin xûya bû. Hêviya Gulbaharê jî, ji wî gikiya û ga ma. Rengê Mémo dîsa sor bû û çavên xwe ji Gulahabarê badan û bera erdê dan. Dest û

piyên Mémo nema digirtin û dilerizîn.

39

Gulbaharê tûrê destê xwe dirêjî Mémo kir û gotî: "Bigi re, ez van hemiyan didim te." Mémo bixçik girt, û nêrî, ji lerizînê, destên wî wek ku teyrokê lêxistibe diçû û dihatin. Gulbaharkê got: "Divê tu vî Ehmedî ku di zîndanê de ye, nîganî min bikî."

Tûr ji destên Mémo ket ser keviran û di bêdengiya gevê de ginqîneke pir mezin derxist. Gulbahar xwar bû, Tûr ji erdê rakir, û ji nuh ve dirêjî Mémo kir. Mémo bixçik negirt. Di rûyê Mémo de dilopeke xwîn nemabû. Hemî xwîna lagê wî hatibû kigandin. Rûyê wî wek kaxizê sipî bûbû. "Bigire Mémo, van bigire, û min û Ehmed rûbarî hev bike. Pigtre jî hêre ji bavê min re hemî tigtî bêje. Bêje ku serê min jêbike."

Mémo bêlebat mabû. Pigtre hêdî hêdî, hinekî serê xwe bilind kir û li Gulbaharê nêrî. Di çavên wî de jana mirinê dihate dîtin. Çavên wî bûbûn wek çavên mirovên ku li ber mirinê bin û can bidin. Gulbahar mecbûr ma û çavên xwe ji Mémo revand.

Bêhemd destê Mémo çû ber pigta wî, bê can, giran... Ji ber pigta xwe kilîtên zîndanê derxistin û dirêjî Gulbaharê kirin û ji wir bidûr ket û çû. Kilîta zîndanê bêhnekê di destên Gulbaharê de ma. Gulbahar nizanibû ci bike, bigirî yan ga bibe. Dudil ma. Dawiyê dest bi girînê kir. Hema li cihê xwe, li ber deriyê Mémo rûnigt. Ter ter girîya. Carekê ket bîra wê ku kilîtê deyne wir û hêre. Le nikaribû bikira. Pigtre bi zor rabû serpiyan. Berê xwe da deriyê zîndanê,

lingên wê li hev diketin, dilê wê ewçend le dida ku hindik mabû ji sînga wê derkeve derve. Kilîta mezin di derî de bi cîh kir û derî vekir. Hundûrê zîndanê pir tarî bû. Li pir jêr, li binê zîndanê rohnayiyê pir qels xûya dikir, Gulbahar, bi pelikandina destan riya pêlikê dît. Hêdê hêdî ji pêlikên kilandî en ku ji beriya avabûna sarayê, bi sed salan mabûn, 40

daket. Di binê zîndanê de qet lebatek xûya ne dikir. Her tigt dûz bû. Li ber ronahiya hindik, her tigt weke tilfê binê avê bû. Di zîndanê de bêhna nekme hîç tunebû. Ji binê zîndanê bêhna çermê tirgbûyî dihat.

Gulbaharê li ser pêlikan rûnigt û xwest binê zîndanê bi bîne. Hêdîka got: "Sofî, Sofî".

Bi dengê Gulbaharê, Sofî bi kiras û derpî û behitî berbi pêlikan megîya û got.

"Fermo Siltana min, tu çawa hatî vir? Paga de serê me hemiyar jêbike. De hêre ji roja ku ev zîndan çêbûye heya îro, bêyî te tu jin ne ketine vir. Jina pêgîn tû yî. Heydê, heydê heydê, derkeve derve. Xwedê bike kesekî hatina te nedîtiye.

"Ehmed li ku ye? Xeberê bidiyê?"

A nuha a nuha" û çû.

Di nav regayiya gevê de dengê piste pistekê hat. Pigtre ew deng hâte birîn. Ê her tigt ket nav bêdengiyeke sar. Dilê Gulbaharê bi xurtî, bi terp û rep lêdixist. Weke ku dilê wê di wê zîdana sar de vedida. Yan jî ji Gulbaharê re usa dihat.

Gulbahar rawestiya, kes ne dihat. Her ku dipa hîn pirtir

xwîna wê germ dibû. Dilê wê hîn pirtir, weke çûkekê birîndar diperpitî.

Vê rewga Gulbaharê heya ku ji nav tariya tilfa gevê sîyek nêzîkî wê bû, berdewam kir. Dema keçikê, sîha ku dimegiya û dihat dît, dilê wê xweg bû. Dest û lingên wê sist bûn, serê wê dog bû heger xwe bi hêtê negirta, de biketana. Dema hilma Ehmed ket ser rûyê wê, bi carekê hat ser hegê xwe. Herdu jî bêhnekê bêdeng man û nikaribû bipeyivin. Pêgî Ehmed peyivî:

"Gulbahar, tu yî?"

Gulbaharê bi dengê pir nizm got: "Belê ez im".

Wekê ku ji mêj ve dostên hev bûn. Bi hev re heval, dost

42

û yar bûn. Ewrê evînê herdû jî pêçan. Germ, xweg û destane... Ev evîn li çarmedora zîndanê belav bû. Di zîndanê de pir kewên gozel hebûn. Sofî ji hin ciyan ew kew peyde kiri bû, anîbûn. Ew kewên han, nivê gevê, destê sibê, nîvro û kengî bibûya, heger dilxweg bûna dixwendin. Ji jêr ji nav tariyê, dengê kewkî hat. Gulbahar bi vî dengê bêwext û bêcîh, veciniqî, destê xwe dirêj kir, bi destê Ehmed girt, ji pê likan derketin jor, gîhagtin nik qûleya zîndanê. Qûle li aliyê degtê bû. Li ber wan bi du gavan gelîyekê bêbinî û bê serî hebû. Li dur stêrk, degt û siya çiyayê Agirî a bi xof û mezin xwe bera ser mitikan dabû, bi jora Agirî jî heyveke kêrnahî ku alîkî wê kêrn û biçûk bûbû li ezmên xûya dibû. Pigtre ewrekî reg û tarî xwe bera ser heyvê da. Gulbaharê destê Ehmed bernedabû û hin destên wan digewitîn... Dema kelegêrên sibê, dest bi xwendinê kirin, Gulbha



r û Ehmed ji bin qulê rabûn. Destên wan, mîna bizotekî  
êgir ku duqat bûbû, ji hev cîhê bûn. Gulbaharê qet ne dixwest  
cîhê bibin. Dixwest heya roj hêre ava li wir birnîne û  
tama girtina destê Ehmed derxîne. Bera pigtî wê, xwîna wê  
ya sor birijiyana ser axê. Carke din bi destê Ehmed girt û  
herdu parçeyên bizot, carekê din gihagtin hev. Her diçû  
derûdor rohnî dibû. Destên wan dîsa ji hev dur ketin.  
Ehmed megiya, çû ket zîndanê. Gulbaharê dengê deriyê  
zîndanê giran ê ku li pag Ehmed hâte girtin, bihîst. Demekê,  
bê ku bizanibe de biçe ku û ci bike, li wir ma. Pigtre ça  
vên wê li kilîta zîndanê a ku di destê wê de bû û diviyabû  
bidana Mémo, ket. Berbi deriyê zîndanê ve megiya. Hat  
oda Mémo. Deriyê odê vekirîbû. Mémo ne li hundur bû.  
şag ma. Bi bazdan çû sarayê li Mémo geriya. Dît ku Mémo  
pigta xwe ji aliyê hundur ve daye hêta bedena sarayê a  
hundurîn û nêzîkî deriyê mezin, li aliyê rastê, rûnigtîye.  
Mémo mîna miriyan bû, ne dilebitî. Dengê lingên Gulba-  
43

harê ji ew giyar nekir.

Gulbaharê li ber guhê Mémo, kilît hejand. Le di rû û  
rewga Mémo de guherînek çênebû. Gulbahar di ser serê  
wî re pa, pa le di wî de guherîn çênebû. Kîlît bera dawa  
Mémo dan û got: "Her bijî birayê Mémo, heya mirinê ez vî  
qenciya te ji bîra nakim."

Di Mémo de dîsa tevgerek çênebû. Gulbahar ji wî veqetiya,  
çû û roj derket.

Ehmed, li binî zîndanê wek kevirekî bi tena xwe, mabû.

Baweriya xwe bi van tigtan nedianî. Dikir, ne dikir, nikari

bû baweriya xwe bi sihra Gulbaharê, bi bêhna wê ya jinantî bianiya je re wek xewnê dihat û ji xwe dipirsî, digot, gelo ev rastî ye, yan xewn e. Carcaran heya bi hestiyên xwe bi evîn, û bextiyarî tije dibû carcaran jî vedigeriya nik tenêbûn û gumanên xwe.

Qey hesp ji bo vê hatibû ber deriyê wî. Qey xwedê usa nivisandiyê. Ev hesp û ev keç ji min re diyariyên xweda û Agiriyê ne. Divê mirov rewayî wan be. Gulbahar weke kulîlkên Agirî teze û bêhnweg bû, meriv ji bêhna wê ya xweg sermest dibû.

Ehmed got: "Sofî bilûrê bide min"

Sofî bilûr dayê. Nuha Sofî, Mûsa Beg, zîndan û kewên zîndanê meqamekî nuh guhdarî dikirin. Heger Gulbahar ev maqam bibihîsta ji kêfan, de dîn û har bibûna.

Wê rojê Gulbahar bê rawestîn di nav qesrê de çû û hat.

Bêheg, bê xwarin û bê ku destên xwe bi tigtekî bide... Bavê wê de Ehmed bernedana. Berdana jî tu caran dé negihagtana daxwazên xwe. Pagayekî tu caran keça xwe nedida çiyayîkî. Him jî çiyayîkî waha serhigk.

Dema dengê bilûrê ê ku ji zîndanê dihat ket guhên wê, li xwe hay bû. Lagê wê ji serî heya nenûkan lerizî.

Xwezî Ehmed ji zîndanê derketa û gevekê bihata ew biavêta ser pigta hespê û berê xwe bidana cola pezkoviyan...

44

Li wan deran çadir û konên êlên kurdan hebûn û Kurd herdem mîvanperwer bûn... A din jî li mirovên çiyayê Agirî bi çavekî dîtir dinêrîn. Di çavên wan de kesên Agirî pir giranbûha û qûtsal bûn. Le li ku bûna bera bibûna, bavê

wê dé ew peyde bikira û bida kugtin. Dest û piyên Osmaniyan dirêj bûn, digihagtin her aliyê cîhanê. De Ehmed jî bikugtana. Dilê wê digewitî.

Diviya îşev jî biçûna ba Ehmed û hergev jî. Le heger bavê wê bibîhîse de ew jî, Ehmed jî bikugta dé Mémo jî bikugta. Rewga Mémo seyr bû. Ew çend zêr ne girtibû kilît dabûyê û çûbû. Gava Mémo dianî bîra xwe, rûyê wî yê xemgîn dihat ber çavên wê û pêrîgan dibû. Ji bo wê jî heya ji wê dihat Mémo ji serê xwe derdixist û ne dixwest Mémo bîne bîra xwe. Ji xwe ji mêj ve bû li Mémo ketibû gumanan. Mémo her dem je re bag bû. Gava çû ba Mémo, dizanibû, ci bibe jî Mémo de daxwaza wê bi cîh bîne.

Heya ku ew li wir di zîndanê de bû, diviyabû hergev bi çûna nik wî. Le çawa her gev jî Mémo kilît tête xwestin û çawa her gev li rûyê Mémo ê xemgîn tête nêrîn. Gava Mémo kilît dabûyê ji mirinê xerabtir êg kigandibû. Ev rewg ne tenê ji çavên Gulbahar ne direviya, ji çavên herkesî nedireviya. Hemû daxwazên hundurê Gulbaharê serî hildidan. Ji bo her tigtî, dijî bavê xwe, dijî toreyên wir, dijî sarayê, çiyayê Agirî û hemî cîhanê derdiket.

Ji dîwanê, dengê bavê Gulbaharê ê qalîh, bilind û toq di hat. Mehmût Xan, merivekî pir çeleng bû. Gava bi kurdî dipeyivî hîn pirtir dilgerm, ji dil û xwîn gîrîn dibû. Dûrvê qertelekî girs dida. Gulbaharê ji heya nuha tenê ji bavê xwe hez dikir. Heyrana wî bû. Bavê wê jî zanibû ku keça wî ji wî hez dike.

Bû êvar, roj çû ava. Gulbahar di sarayê de çû û hat dog bû. Lé lingên wê ji dîwanê dur ne diketin. Li dîwanê kesek

45

nemabû. Gulbaharê ew ji birîna deng fêm kiribû. Bavé wê nuha sedî sed nimêja pagîvê dikir.

Gulbaharê di dilê xwe de got, ez nuha herim, xwe bavêjim lingên Mehmût Xan, bibêjim, ez ne keça te me Mehmût Xan, ez tikaker im. Li ser çogên xwe, kagkagî hatim gel te, ji bo tu Ehmed bidî xatirê min, xanê xanan, Mehmût Xan. eslê xwe ji bîra meke, Mehmût Xan. Navudengê eslê te ji Agirîyê mezin çêbûye, dapirê min usa di got, ma qet te ev tigt ne bihîstiyê. Mehmût Xan? Digotin li kêleka mala me hêlîna qertelan hebûye û bibêjim...

Carekê gava legkerekî derî vekir, tigtek nemabû ku der basî hundur bibe. Xwe bi zorê girt. De biçûna xwe bavêtana lingên Mehmût Xan. Dilê wê hat ber devê wê. Xwe ji ber deriyê dîwanê da alî. Heger, hew ji bo wê bibûna kar hesan dibû, le heger hayê bavé wê je bibûna, de Ehmed bidana kugtin.

Heya nivê gevê xew neket çavên Gulbaharê. Hemî xelkên qeza Beyazidê razabûn. Ji dengên zincîran en ku car caran ji zîndanê dihatin, pêve tu dengên din ne dihatin bihîstin. Gulbahar demeke dirêj di nav nivîna xwe de, xwe da vî alî û wî alî.

Dawîya vî karî tunebû. Çawa bûna jî de rojekê bihatana girtin. Bavé wê de Ehmed bikugta. Heya îro di vê serayê de tigtekî ku vegartî bimana tunebû. Doh yek îro dudû, xwîgkên wê hay li guherînên wê bûbûn. Heger kesekî hevdîtina wan bidîtana, serê sibê de saray serûbin bibûna. Yan jî Même dergevan ji tirsê, ji bavé wê re bigota, de serê xwe

xelas bikira. Ma gelo Mémô de bigota?...

Van ramanan û tirsê ne hîgtin ku ew razê, rabû ser xwe. Hew dît ku ew li ber deriyê zîndanê ye. Demekê li wir çû hat. Gihagt ber deriyê Mémô. Hinekî jî li wir pa. Dilê wê nedigirt ku li derî bixe. Hîssên ku di dilê wî de bûn, tirs, germ li berketin, hemiyên li ber hev didan. Mémô li hundur

46  
tê gihigtibû ku ew hatiye ber derî, diramiya. Bi carekê derî vekir. Gava Gulbaharê ew dît pagde vegehiya û megiya. Mémô ji pagve gihagtê û kilît dirêjê wê kirin. Oda xwe ganî wê kir û bi dengê nizm got: "Li vir peyiva xwe bikin". Gulbahar bi hemî hêza xwe deriyê zîndanê vekir. Ji pêlika kevirî berjêr bû. Bang kir. "Sofî! Sofî!"

Bêhna Ehmed çikiyabû. Ji evarê ve çavnêriya wê dikir. Ji dema çûbû û vir de, her gav li benda wê bû. Dengê biçûk dibihîst, radibû ser xwe. Bi lez çû nik Gulbaharê. Destên wan mîna bizotên êgir gihagtin hev.

Ji bo ci Mémô oda xwe ganî wan kiribû û gotibû, li vir bipeyivin.

Ma Mémô melek bû? Ma merivekî ew çend dilsoz

û ciwamêr dikaribû li cîhanê bijî? Şewatek ket dilê Gulbaharê. Ehmed bir aliyekî din. Dîsa ew bir ser zîndanê, aliyê rastê ê qûleya zîndanê, li jora gelî, li bin dîwêr rûnigtin.

Destên wan di destê hev de, dilê wan bi hev re usa bêdeng

man. Di bêdengiya gevê de, dengê herikîna xwîna hev dibihîstin.

Gulbahar bidengekî dilgewat pirsî: "Ma raste?"

Ehmed Got: "Ci?"

Gulbahar: "Di nav çel rojan de heger tu hespê neynî

bavê min de serê te ê Sofî û ê Mûsa Beg bide jêkirin."

Ehmet got: "Rast e."

Gulbahar mîna binale peyivî. Le ne hat zanîn ku ci got.

Ehmed "Ma ez têm bîra te? Dema ku li zozanan li ser gola Kûpa dawet çêbûbû?"

Gulbahar got: 'Tu caran ji bîra min neçûyî. Tu sergovend bûyî. Ma ez jî têm bîra te? Ehmed:

"Wek a nuha têtî bîra min. Di lingên te da pawanên ser en mercan hebûn."

Gulbahar ne li ser hegê xwe bû. Di nav xewn û xeyalên xweg de bû. Hêdîka peyivî û got:

"Li zozên li ser gola Kûpê, dengbêjekî pordirêj bi sêroj û  
47

se gevan stirana Siyamend û Xecê gotibû, xellas nekiribû û hîn di destpêka stranê de bû.

"Ew wê istiranê di çel rojan de xellas dike." "pir dirêj e".

Gulbahar: "Heger hesp neyê, bavê min de serê we hersiyan bide jêkirin" Kesreke pir kûr kigand û got "Axx...

Ehmed got: "Dé serê me bide jêkirikin, bera bide jêkirin. Le ma serê Sofîyê sed salî jî têt jêkirin? Aha ev zilm e.

"Ji roja cîhan bûyê cîhan, zilma waha ne hatiye kirin, ne hatiye dîtin, ne hatiye bihîstin. Heyfa Sofî, pir pîr bûye. Le qet ne xema wî ye. Her li bilûrê dixê. dikene, bi pigta xwe ya xûz dilîze. Gunehê min li Sofî têt. Pir gunehê min têt.

Heger ji destin min bihata, min de Sofî xellas bikira. Serê kalemêrekî wuha nayê jêkirin. Dibêjin page dibêje, ez de liber çavên wan pêgî pêgî serê Sofî bidim jêkirin.

Gulbaharê got: "Bera qet kes neyê kugtin".

Ehmed got:"Bera page nebihîse. De te jî bikuje."

Gulbaharê bersîva wî da: "Bera bikûje." Bi dengekî ter û bixwe bawer: "Bera bikuje."

Ehmed: "Dilê mi ji bo Mûsa beg jî digewite. Ji rûyê min e. Ma ez hespê bidim anîn? De bibêjin ji cane xwe tirsiya, hespê ku diyariya xwedê bû dîsa zîvirand page. Ez nikarim li rûyê kesekî binêrim. Le cane Sofî û Mûsa Begê?

Weke ku parçekî gogt ketibû gewriya Gulbaharê. Serê xwe danî ser sînga Ehmed. Bê rawestîn digiriya. Di dilê xwe de digot, serê hespê bixwe. Serê hespê bixwe. Kelegêrên sibê bang didan. Ji çiyayê Agirî royê sor di kir. Ne wek royê bû. Mirova digot qey sêveke camîn û sor e.

Destên wan mîna xuriya êgir ji hev veqetiyên. Ehmed berê xwe da zîndanê. Gulbahar bê, lelat li wir ma. Li pag wî nêrî û ma. Ji bo rabûnê di çogên wê de hêz nemabû. Dema nîvro bû hê ji nuh ve ji cîhê xwe rabû. Difetisî. Mafir bavê wê gotibû ez ê wan bikujim, dé pêkbanîna. Ji 48

padîgahê ferman jî bihata de bikugta. Heya nuha keskî ne dîtiye ku wî peyva xwe xwariye. Rewga Ehmed jî pir xerab bû. Heger hesp bidana û ji zîndanê derketana êdî di çavên xelkê çiyayî da ne hêjayî pêne qirûgan bû. Gunehê Mûsa Beg û Sofî ci bû? Ehmed de çawa ew bi xwe re bibirana mirinê?

Ev yek him ji bo Ehmed him jî ji bo Gulbaharê bûbû derd û kul. Mirina Ehmed jî, ew xellas ne dikir.

Ji bo Gulbaharê hîvîyeke biçûk jî tunebû. Li tu çîyan rohnayî xûya ne dikir. Bêhêvîtiyê wek aveke hêdî doralîyê

wê girtibû. Wê de bifetisandana. Di jiyaneke de kêfxwegiya çel rojî...

Heya mirinê dilxwegiya wê de ev bûna. şahiyeke çel rojî. Ew gahî jî bi girtina destê yekî mirî dibû, bi hembêz kirina yekî ku li ber serjêkirinê ye, dibû... Ehmed hespê bîne û serê wî jinebe jî, gulbahar de nikaribe heyra mirinê carekê din wî bibîne Ehmed de biçûna çiyayê xwe, ew de jî fena kevirê binê bîre, h serayê bi tena xwe bimana. Ji bo wê êdî jiyîn tamam dibû. Bi ser de Ehmed ji hesp ne dida. Li ber çavên Gulbaharê serê wî de jêbikirana. Serê bi xwîn, û jêkirî bi darekî ve girêbidana û li bajêr bigerandana. Ew rîha wî ya zêrîn bi xwînê, dé bihata avdan. Gulbahar difikirî, di got, dilê min ne digirt ku wî rûyî maç bikim, ew dé di xwî na ser de bidin, û digiriya.

Û lagê Ehmed de ji birca kelehê biavîtana, jêr. Li vî alî û wî aliyê zinaran biketana, perçe bibûna û biketana, binê gelî. Digot: "Destê min nediçû ku maç bikim". Gulbaharê cane xwe xistibû devê xwe û li riya rizgarîkirina Ehmed digerîya diramiya.

"Bera ew bijî, bera qet ez jî heyra mirinê rûyê wî nebînim. Bera ew bijî... Û li çiyê mîna kerîya guran zarokên wî çêbin. Tenê bera ew bijî bera ez bimirim.

Dibe ku çareyek peyde bibûna. Ma bavê Mûsa Beg de

49

bihigta ku serê lawê wî welê jêbikin? Begên Kurd en din... Mûsa Beg bûbû goriya derewên wan. Heger ew herin, ji bo serê Sofî, Ehmed û Mûsa Beg wî hespê ji xelkên Agirî bixwazin gelo çiyayî dé hespê nedin?



Çiyayî merivên serhigk in. Li kesekî guhdarî nakin. Le kesek biçûna ji wan hêviya tigtekî bikirarana tu caran ew destvala venedigerandin. Li Agiriyê her tigt li gora toreyan dimegiya. Kesekî nikaribû pêl toreyan bikira. Vê ramanê piçekî hêvî da dilê wê.

Pigtre hat bîra wê. Ya ez biçim ji çiyayîyan hespê bixwazim? Çiyayî tu caran jin nedigikandin. Kengî beg ji bavê min tirsiyan û neçûn ba çiyayîyan ez dé biçim nik çiyayîyan... Ezê Ehmedê xwe rizgar bikim. Carekê din jî heya mi rinê rûyê wî nebînim. Bi qasî kerîkî guran zarokên wî bibin...

Divîya ji yekî re, ji yekê ku ew pê bawer bû, ew yek bigota. Dibe ku ew bi xwe biçûna nik çiyayîyan. Yan jî ji bavê Mûsa Beg re xeberek biganda. Da ku bavê Mûsa Beg bigandana nik çiyayîyan.

Heya sibê dilê wî girt û da. Birayê Gulbaharê,ê

50

ji de û bavê wî, Êsif, ji wê pir hez dikir. Hat bîra wê ku dilê xwe ji Êsif re veke. Gelo Êsif dé ew ne kugta? Gelo Êsif yekê ku mirov pê bawer bûna? Êsif de bi wê re biçûna hesp bixestena? Yan heger biçûna nik çiyayîyan, çiyayîyan ew di cîhê Ehmed de bigirtana? Ew bi xwe, bi serê xwe biçê de dest daneynin ser wê? Gulbahar xwe bi xwe aciz bû. Ê got ez neheqiyê li çiyayîyan dikim. Ew ne mîna bavê min in. Ew, mêvan û qasidên ku diçin nik wan dil nagirin. Ew destên xwe nadin jinekê ku ji bo tikakirina tigtekî çûye nik wan. Jinikek ji wan re ci bike bera bike dest nadin wê.

Çû odayê Ûsif. Ûsif hîn raneketibû. Li ser texte xwe paldabû. şûrekî kevin, tûj û pak dikir. Dixwest nexg û nivîsana ser gûrê biderxîne.

Gava çavên wî bi Gulbaharê ketin bigirî û got:

"Xêr e Gulbahar, vê nivê gevê?"

Gulbahar çû li nik wî rûnigt. Rûyê Ûsif ziravî dirêj, zerî çilmisî bû. Mirov digot qey, rûyê wî hîç tav nedîtiye. Ûsif pir jî dirêj bû. Bi awakî xweg li Gulbaharê nêrî. Çavên wî tije pirs bûn. Gulbaharê destên xwe avêtin istûyê birayê xwe û da girî. Pigtî ku hinek giriya, Ûsif bi dengekî sar wek qegayê pirsî: "Ci bûye. Çima tu didî girî Gulbahar?"

Gulbahar got: "Hebe tunebe, tu dikarî ji derdê min re çareyekê bibînî."

Lêvên Gulbaharê lerizîn. Demekê bê peyv ma û pigtre got:

'Tu de min ji mirinê rizgar bikî'.

Ûsif hîn pirtir gagbûyî lebikî û qîriya:

"Ci bi te hatiye keçê?"

Gulbaharê li ser hev û zû zû gotê: "Bavê min de serê wan bide jêkirin. Divê em rê li ber wî bigirin. Em herin nik çiyayîyan, hespê ji wan bixwazin, çiyayî de hespê bidin me. Birayê min Ûsif heydê em herin nik çiyayîyan... Dibe?"

51

Ûsif got: "Ji te re ci ye? Ci karê te bi wan heye? Gava bavê min serê wan xayinan jêbike çewtî nake. Ci karê te bi wan heye?."

Peyva xwe bi carekê re qût kir û çîk çîk li Gulbaharê nêrî û qêrîn pêket.

"Yan na Gulbaharê, yan na?"

Gulbaharê bi dengekî pir nizm got: "Belê"

Ûsif çeng bû ser piyan.

"Ew Ehmed e ne wer? Bavé min dé te bikuje. De bikuje!

Bavé min de te bikuje, bikuje..."

Usif di nav odê de diçû û dihat. Hin bi hin ji ser hegê xwe diçû û dihat guhartin. Mirov digot qey govendeke agir a kevin digerîne. Û di ber xwe de jî digot: "Bavé min dé te bikuje,... bikuje... bikuje... bikuje..!"

Weke ku dinalîya, qet ranediwestiya. Ji tirsan çavên wî fireh bûbûn. Gulbaharê got qey wî hegê xwe wenda kir.

"Ûsif tu dîn bûyî?"

Ûsif pir kenîya û lé vegerand. 'Tu dîn bûyî tu! Tu dîn bûyî, Tu!... Bavé min dé te bikuje".

Gulbaharê bi hêviya dawî got: "Ûsif, Ûsif Ûsif tu de bi min re werî em biçin hespê bînin?"

'Tu dîn bûyî. Tu dîn bûyî?"

"Le heger hesp neyê dé serê wan û serê Ehmed jêbikin Ez ê jî xwe bikujim."

'Tu xwe mekuje Gulbahar. Ci dibe mekuje. Ez nikarim hespê bînim. Bavé min dé te bikuje. Dibe Gulbahar, ci dibe xwe mekuje. Belê Gulbahar?"

Ûsif gag mabû, tirsiyabû. Tirs, lebak û rewga wî Gulbahar jî tirsandibû. "Di te de hêvî nîne," Gulbaharê destên wî girtin û naliya "Lé vî tigtî ji kesekî re mebêje. Ûsif ji diya min re jî... Heger haya Gulistan û Gulrîzê jî ji vî tigtî hebe dé min bikujin, de min perçe perçe bikin. Ji kesekî re nebêjî. Dibe?"

"Ezê ê çawa bibêjim? Pigtre bavé min dé te perce perce bike. Her tîkekî te jî de bide segekî. Ma tu nizanî ez na bêjim? Tu jî ji kesekî re mebêje Gulbahar".

Ûsif hatibû guhartin. Ji çavên wî tirsê xûya dikir. Tirsiyabû teyrek dema ditirse çawa serê xwe dixê nav perên xwe, ewjîwahabûbû.

Gulbaharê ew tigt ji Ûsif hêvî nedikir. Ûsif merivekî leheng û xwînsar xûya dikir. Çawa bi wî xapiyabû. Gelo Ûsif dé bikaribû ji bavê xwe re hemî tigt bigotana? Kî dizane dibe jî hêre û hemî tigt jî ji wî re bibêje. Ew çend tirsiyabû, heye ku vê tirsê, hemî tigt bi wî bidana kirin. Gulbaharê Ûsif di nav wê tirsê de higt û ji odê derket.

Li navsera çiyayê Agirî, roavayê bagûr bi navê gola Kûpê golek heye. Gol bi qasî cihê bendera kayê ye. Rengê ava golê gînê tarî ye. Mîna çalê ye. Di jêra zinarên tûj û sarê tarî de ye. Hersai gava bihar destpêdike hemî givanên Agirî rîyê tîn qiraxa golê, kulavên xwe en bi nîganê royê, li ser axa reg radixînin. Û li dora golê rêz dibin. Bilûrên xwe derdixînin, ji avêtina tîrêjîn royê heya roj diçe ava li çîroka hêrsbûna çiyayê agirî dixin. Çavên givanên çiyayê Agirî xwegik, reg û xemgîn in. Tilîyên wan dirêj û pir xwegik in. Rihên hinekan xelek xelekî û zerê zêrînê ye. Dema ew li bilûrê dixin, çûkekî sipî û biçûk li ser serê wan dizivire. Gava ro diçe ava, givan di nav tariyê de wenda dibin û diçin, tam wê gavê çûkê ku di ser wan re dog dibû, dadikeve ser golê, baskên xwe li ava gîna tarî dixê, pigtre ew jî bi givanan re di nav tariya gevê de wenda dibe. Li cîhê ku çûk baskên xwe dixê avê, pêlên biçûk çêdibin. Ew pêlên biçûk

freh dibin û tîn li qiraxa golê dikevin. Pigtre siya bi hespe  
kî mezin dikeve ser ava golê, diherike û diçe.

Saray li aliyê bagûrê çiyê, li serê zinarekê avabûbû. Di  
jêre wê da gelîkî kûr hebû. Ji binê gelî degt dest pê dikir.  
Di degtê re riyên mezin derbas dibûn. Qeza Beyazidê li  
53

Rohilatê sarayê h qiraxa Agirî cîh girtiye û malên wir jî  
hemî ji axê çêkirî ne.

Çirayê dikkana Hisoyê hesinkerê por sipî a ku di bin zinareke  
mezin de bû heya sibê pêdiket. Heya sibê çirîska  
rohnayiya hesinên wî kom kom di nav tariyê de belav dibû.  
Hin caran wan çirîskan wek çirûskên muqeddes doralî  
rohnî dikirin. şevên ku kêfa Mehmût Xan xweg dibû, heya  
sibê ji pencereya xwe li çirîskên ku ji deriyê Hiso derdiketin  
û di tariyê de wenda dibûn, dinêrî.

Salên Hiso nedixuya. Li wê dikanê ew û pêne lawên wî  
bi hev re dixebitîn. şûrên bi zêr neqigandî tûj û saxlam çêdikir  
roja ku xwe naskiribû û heya nuha Hiso lingên xwe  
neavêtibû sarayê û qesra Beg. Di meha rojiyê de rojî nedigirt.  
Qet nimêj û dua nedikirin. Hinan digot Hiso baweriya  
xwe bi êgir tîne. Hin gevan Agirê xwe xweg dikir, dikir  
hundurê dikkanê û deriyê wê di çirîskên êgir de dihiqte.  
Hiso li ber wî êgirî li ser çogên xwe rûdinigt û destên xwe ji  
êgir re vedikir.

Ci havîn, ci zivistanê Hiso tigtek li xwe nedikir. Hew li  
ranên xwe galikeke pir qalin dipêça. şemleke sor li nava  
xwe digerland.

Gulbaharê bêhêvî li pencereyê derve dinêrî. Xelkên bajêr

hemî di xewê girîn de bûn. Çêkên êgir kulu, kulu ji dik kana Hiso difiriyên û di nav tariyê gevê de kom kom wenda dibûn.

Û li hundur, li zîndanê, Sofî, ji kûraniya dilê xwe li bilûrê dixist û li çîroka serpêhatiya Agirî dixist. Li cîyekî dur, li degta Beyazidê, hespek dihîriya mirov digot qey dîn bûye. Bi tirs û bi lebig.

Gulbaharê got: "Sofî".

Sofî bilûra xwe danî û bersîv da: "Sofî bi goriya te be".

"Hindik ma ku serê we jêbibin. Ma qet çareyek nîne?"

Sofî got: "Nîne."

54

Gulbaharê got: 'Tu ji vir derkevî û biçî hespê bînî, serê wanjênabe...'

Sofî got: "Nabe, hesp nayê Sofî bi goriya zimanê te be".

Di wê tariyê de ew û Sofî demekê bêdeng li ba hev rawestiyan.

Ne Sofî axifî ne Gulbahar.

Gulbaharê bi dengê nizm gotê:

"Le nabe" got dengê wê miçiqîbû. 'Tucaran nabe. Guneh e. Zilm e, nabe... Xwezî ev saray ji binî hilwege".

Dengê wê hîn pirtir miçiqîbû.

Sofî got: "Bera ev saray hilwege".

Dengê Sofî ê nerm bi dengê Gulbaharê ê miçiqi ve tevli hev bû.

Gulbaharê: "Ji bo hespekî, ma hêja ye ku car can herin".

Sofî bersîv da: "Ev saray de hilwege. Ew ne hespek e.

Hezar saray..."

Gulbaharê "Gelo tu çare nîne. Sofî, ma tu dibêjî ez bi

çim çiyê? Bigihê m ezbeta Ehmed, bibêjim Sofî hespê dix waze?

Sofî got: "Nabe"

Gulbahar: "Ma ez herim xwe bavêjim dest û pîyên bavê xwe ji ba ku dev ji hespê berde?"

Sofî got: "Nabe delalîya min". "Nabe, Sultana min. Ma canek ew çend hêja ye? Sofî bi goriya zimanê te be. Ew zi manê hungivîn û xwegik... Sofî bi goriya pore te yê zer be. Sofî bi goriya çavên te be. Çavên ahû...Sofî goriya bejna te, bejna zirav..."

Sofî bi goriya dilê te be, evîna leyla... Him jî kura êgir... Ezgorî, çareya hertigtî heye lé dawîya vê evinê nîne. Sofî goriya bêçaretîya te be. Ji bo te ev a bi xêr e... Sofî goriya bêhêvitîya te be".

Gulbaharê got: "Ez dizanim" û ji kûr de keserek kigand.

"Ev ji ba min hîn çêtir e. Ez dizanim ku dur yan nêzîk bavê min dé serê we herduyan jî jêbike. Lé hindik ma Sofî 56

pir nêzîk bavê min de serê we jêbike. Ez de jî xwe li ser goristgana wê bikujim. Sofî ez xwe davîjim bextê te, alîkariya me bike."

Sofî carekê din ne peyivî. Gulbahar bê ku bizanibe ci dibêje, peyivî. Sofî wek kevîrekî bêdeng ma. Carekê din deng ji Sofî ne hat.

Gava Gulbahar ji wir çû. Sofî bilûr xistibû devê xwe û heya sibê li bilûrê xistibû.

Gulbaharê ji pencerê temaga tariya gevê dikir. Carekê din li dikkana Hiso nêrî. Ji dur ve li serhêla Agiriyê xumîniyek

bi çiyê ketibû. Mirov digot qey çiya bêhnê digire û dide.

Ji dikkana Hiso, kulmek çirîkên êgir peqîyan û deriyê dikkanê rohnê kirin. Dengê Hiso û xirnîna çiyê di nav hev de wenda bûn.

Gulbaharê nikaribû di cîhê xwe de raweste. Dil, mejî, serî û hissên wê hemû bi hev re ji bo peydekirina çareyekê dixebitîn. Gulbaharê ji mare erdê bigire heya bi çûkên ezmana hêviya çareyekê dikir. Diavêt wî alî ne dibû, diavêt vî alî nedibû. Çuqas radikir û datanî bêçare dima. Bê ku çavên wê tigtekê bibînin, di sarayê de diçûn û dihatin. Bi carekê ket dilê wê û got:

"Ev Hiso agirperest e. Sêrbaz e. Merivekê bag e jî. Divê ji vî derdî re çareyekê bibîne."

Hema derket derve. Raste rast çû dikkana hesinker. Di nav kulmek çirîsk de derbasî hundur bû. Hundurê dikkanê germ bû. Weke herdemî jora lagê Hiso tazî bû. Wî, gava Gulbahar dît gag nebû. Destekî wî bi hebana wî ve bû. Hebana xwe kigand. Piçek serê xwe zivirand û li wê nêrî.

Weke ku ji zû ve ye li benda Gulbaharê bû. Di rûyê wî de hawakî waha çêbû. Hebana xwe ranewestand. Hinekê li hesinê ku di nav êgir de ye nêrî. Hesinê mîna pizot ji argûnê kigand, danî ser êrs, denbor lêxist, ji wî hesinê bi qasî ku

57

hundurê dikkanê rohnê be, çik belav bûn.

Pigtî hinekê Hesinker Hiso bigirî û got:

"Bi xêr hatî Gulbahar Xan".

Dilê Gulbaharê xweg bû.



Dengê Hiso bawerî dida merovan û pirî germ bû.

Pêgî Gulbaharê çîroka hespê hemû ji wî re got. Hiso got:

"Dizanim".

Pigtre êdî ci hat bîra wê ji Hiso re got. Rewga Ehmed,

Sofî û Mûsa Begê jî wî re da zanîn.

Hiso bersîv da: "Dizanim".

Pigtre Gulbaharê evîna xwe a ku ji bo Ehmed dibihîse ,

got. Hiso ne go ez zanim, ne jî got nizanim... Kûr kûr ra

miya.

Gulbaharê go: "Hefteya pêgîya me, roja gemiyê bavê min

dé serê wan li kelehê bide jêkirin. " got "Ma qet çareyek

nîne?"

Hiso bersîv neda. Her waha ramiya û ma. Bizotên argûnê

xwelî girêdan. Hesin sar bû. Hiso bû wek qegê û ji cîhê

xwe neleqiya.

Bi bangdana kelegêrên sibê, serê xwe bilind kir û got:

"De ka sibe êvarê were nik min... Dibe em riyekê peyde

bikin. Dibe ku çareyekê!"

Hêvîyek ket dilê Gulbaharê.

Rayê serê xwe ji qiraxa Agirî bilind kiribû usa li cîhê xwe

mabû û sor fikir sor û sor... Bayekê hînik ji çiyê berbi jêr

dihat. Wek ku diriçîya... Bayeke ku çit û çit deng derdixist.

Ew roj ji Gulbaharê re gelekê dirêj hat û le nedibû êvar.

Li ber pencereya sarayê a ku li beranberê dikkana Hesin

ker bû, rûnigtibû û çavên xwe ji dikkanê nedirevand. Her li

wir dinêrî. Bendî sihêrekê bû.

Le devê deriyê dikkanê refek çûkên sipî çeng dibûn, refekî

din, yekî din çeng dibûn. Ezmanê sarayê sipî dibû,

hemî deriyên sarayê vedibûn. Ehmed û Gulbaharê, xwe li çiyayê Agirî li nik gola Kûpê di nav qertelên mezin de dest bidest didîtin. Çavên wan li hevûdin diket û her du bi hev re dikenyan. Wê rojê heya bû êvar, di dikkana Hesinker de ji bo Gulbahar pir sihêr çêbûbûn. Gulbaharê çend caran xwe xistibû cihê keça ku di nav çîroka stranê Agirî de bû û bextiyar nebûbû.

Û gava ro çûbû ava taqeta Gulbaharê nemabû. Ji dest û piyan bûbû. Nema dikaribû ji cîhê xwe bilebite. Nîvê gevê dema kelegêran bang dan bi hal bûbû. Xwe bi dîwaran girt û dilê wê wek dilê çûkan diavêt, çû nik Hiso.

Hiso têgihigt ku keçik bûye nîvmirî. Di dilê xwe de got: "Heywax min nizanîbû ew çend e . Di rojekê de keçik bûye wek miriyan".

Hiso jî dabû bala xwe û ramiyabû. Le riyek nedîtibû.

Gulbaharê welê li Hiso dinêrî ku... Wî nikaribû bigota min çareyek peyde nekir.

Hiso got: "Keça min, berî serê wan jêbibe ez de riya anîna hespê peyda bikim. Tenê li wê gundê jêr li ser riya Karwanan şêxê Karwanan heye. Tu hêre nik wî jî."

Gulbaharê got: "Ez şêxê Karwanan dizanim. Le ew nax waze kesekî bibîne."

şêxê Karwanan pir kal bû. Rîha wî ya dirêj û sipî, wek berfa ku tav bidiyê, hertim dibiriqî. Bi gev û roj li ser postekî hirçan ê pir qalin û bi pirç rûdinigt. Sêx mîna lepek hestî mabû.

Li ber mala wî dareke berûyê a ziyaretê hebû. Ew dar jî

biqasî wî gêxî muqqeddes bû. Dibe jî, ji şêx bêhtir ew dar  
ziyaret bû. Xelkên wê herêmê kerametên wî Çêxê û wê  
darê digotin, digotin, xellas nedikirin.

Di ber mala şêx re , riya karwanan derbas dibû. Riyên  
ku ji Erebestanê, Trabzonê û ji temama Enebolê dihatin,  
li wir digîhagtin hev û ji wir jî diçûn Tûranê, îranê, Hîndist  
59

tanê, Çînê û Maçînê. Karwanên ku ji wir derbas dibûn,  
hinek pèrê diavêtin bin koka wê darê. Kesekî nediwêrî de  
stên xwe di wan pereyên ku bazirganan diavêtin bin darê,  
bidana. Ew pèrê li wê kom dibûn û diman. Ji cejn heya cejna  
din şêx ew pèrê li xelkên belengaz belav dikirin. Kesekî  
nikaribû, bê danina peran ji wir derbas bibûna. Kê pèrê  
dananîna û derbas bibûna li rê belayên mezin dihatin pêgiya  
wî û ew tigt li ser zimanê xelkê dibûn çîrok.

Herjev di ser dara ribazek re stêrika Karwanan, heya  
berbangê diçirisî. Karwanên ku riyên xwe gag dikirin, li wê  
stêrkê dinêrîn û riya xwe dinasîn. Digîhagt hawara kerwanên  
ku serê wan di belayêde bû.

Hiso gotê: "Tu wî re bibêje, Hiso ez gandime, bag e?"

Gulbahar çû wir. Rûyê xwe di wê darê û di êgîga mala  
şêx da. Çû hundir bi silavên Hiso, en ku ji şêx re gandibû,  
Sêx dîtina wê qebûl kir.

Çavên şêx en gîn wek stêrkan bûn. Rûyê gêx wek kaniyekê  
qet aloz nebûbe, zelal, pak rahnê bû. Gulbahar li ber wî  
xwar bû û se caran ji destên wî maç kir. û je re got:

"Ez serekerwanek im, şêxê min". Got. "Serekarwanekê  
ku li çiyê maye û hatiye nik te. Min riya xwe gag kir. Serekarwanek

im ku li çiyayê Agirî ketime ber bayekî xurt û heger tu negiyê hawara me, em hemî de ji hêza bayé bigikên. Ez teyrêkî nîv canî me û hatime li ser dara ribazekê ber mala te dabezyame û teyrên nêçîrê nikulên xwe tûj kirine, lepêgkên xwe derxistine li dora min diçin û tèn û dilê min dikalin."

Vê rewga keçikê dilê şêx gewitand. Xwegikbûna keçikê jî ew girt bin sîdara xwe û got: "Derdê xwe bibêje keça min". Gulbaharê ji serî heya dawî çîrok ji re got. Şêx destên xwe xiste nav rîha xwe kûr kûr ramiya. Pigtre berê xwe da stêrika Karwanan a ku li ser xaniyê wî weke êgir diçûrisî. Pir ramiya. Ew çend ramiya ku ji rûnigtina pir, çogên Gul-61

baharê tevizîbûn.

Pigtre got: "Rabe hère keça min. Berî serê Ehmed jêbibe, hin tigtên bi xêr de bibin. Beriya serê Sofî û Mûsa Beg bête birîn... Alîkî stêrkê tarî bû, aliyek di nav rohnîyê de ma. Rabe hère keça min. Hêvîdar im ku tu bextiyar bibî. Hère ji hesinker re welê bibêje. Ji bo hesp çareyek de bête dîtî û hère je re bibêje bera were vir."

Gulbahar ji wir derket, serê wê gêj bûbû. Hêvîya wê a biçûk hinekî din biriqî bû. Çû sarayê û pa. Le dilê wê di sînga wêde cîh nedigirt. Bi gêx, hesinker, dara rabezek û stêrika karwanan bawer bû. Bawer bû le, her ku roja serjêkirina wan nêzîk dibû, bêhtengiya bavê wê hîn pirtir dibû. Kesek newêrîbû nêzîklî wî bibe. Ji kesekî re yek gotin ne digot, tenê bi serê xwe, xwe bi xwe aciz û dîn dibû. Rengê wî çilmisî û zer bûbû. Hinarkên rûyê wî dixistê vê rewgê.

Di vî îgî de tigtek hebû ku bi wî giran dihat. Lé wî nizanibû ev ci ye?

Êdî Gulbahar ditirsiya biçe zîndanê. Mémo li hemberî wê pir nerm bibû. Mirov çawa derdê kesekî bêxwedî, nexweg û bêçara bag dike, Mémo jî ji Gulbaharê re usa alîkarî dikir. Hemû xûrûr û gexsiyata wê bi wê rewga xwe dixist bin piyan. Di hemû helwestên wî de rewga melek û pêriyan hebû. Pêriyek ku ji cane xwe bêzar bûye. Di çavên Mémo de jî bedbaxtiyeke mezin, evîneke kûr û bêhêvitîyek dihat xwendin ku heya nuha Gulbaharê di çavên kesekî de nêrîna usa ne dîtibû. Dibêjin ya, nêrîna wî kevir û hesin qui dike û digîhê heya kezeba mirov a wî jî usa bû. Hemî bextregî û evîna cîhanê hatibûn di çavên wî de kom bûbûn.

Pigtî wê, Gulbahar li ser Mémo jî pir ramiyabû. Mémo serê xwe xistibû bin çengên xwe û hemî daxwazên wê mîna yekî avisînî re dianî cîh. Him jîbi dilxwegîyeke bêsinor, hezkirineke bêpayan ev tigt dikir. Ji Gulbaharê re wekê di hat, ku bigota Mémo cane xwe bede min, Mémo de ji 62

dilxwegî dîn bibûna. Gelo Mémo evîndar bû? Gelo Mémo digewitî? Heger waha bûna ma ew û Ehmed dianîn ba hev. Him jî bi bextiyareyeke pir mezin? Heger waha bûna, ji çerm û çavê wî, mezintirîn bextiyariya cîhanê dihate dîtin û qehra mezin...

"Mémo, Mémo merivê me Mémo, ez vê çêyî û dostaniya te heya mirinê ji bîra nakim. Heya ev giyan ji vî lagî dernekeve, ez te ji bîra nakim".

Gulbahar bêyî ku xwe ganî Mémo bike, li ber deriyê zîn

danê diçû û dihat.

şev bû, ji deriyê hesinker kulu kulu çêkên êgir dipeqijîn.

Di wê geva rohnî û sayî de stêrik li ser ezmanê çiyayê Agirî belav bûbûn. Qet deng tunebû. Dengê pela bakî biçûk jî nedihat.

Gulbahar wê gevê heya sibê, bêrazan li ber pencerê ma.

Gava tîrêjên rojê avêtin, ji kêfan dilê wê hat ber devê wê.

Li ber dikkana hesinker hespekî bi zîn hebû. Pigtî bîstekê

hesinker ji dikkanê derket li hespê siwar bû û berbi çiyê

ajot. Gulbaharê dizanibû, ew diçû ku hespê bîne û sedî sed de bianîya.

Li wê herêmê herkesî bihîst ku li ser daxwaza şêxê kar

wanan, Hiso çûye bo çiyayîyan, ji bo hespê bîne. Hemî xel

kê Agiriyê ji bo vê yekê kêfxweg bûn. Ji ber ku merivekî

wek Hiso gava mohra şêxê karwanan bigire û biçê ba

çiyayan nedibû ku destvala vegeriya. Li vê herêmê, tu kes

tunebû ku dijî mohrê rabûna û kes tunebû ku rûyê xwe di

wê mohrê nedana. Begên Kurd en ku xeber bihîstin û bavê

Mûsa Beg, kumên xwe en kulavîn li xwe kiribûn, postên

xwe en bizinan avêtibûn ser pigta xwe, peyayên xwe dabûn

pag xwe û hatibûn Qaza Beyazidê. Hemî kêfxweg bûn. Lé

tu kes ji wan, hoya çûyina Hiso tînegihigt. Çawa şêxê kar

wanan, ew şêxê mezin dest avêtibû vî tigtî? Ji ku bihîstibû

63

ku ji bo hespekî serê se kesan de jêbibe? şêxê karwanan

têkiliya xwe ji vê cîhanê û karê wê nedianî ku....

Ji bo jêkirina serê wan, se roj mabûn. Heger hesinker

Hiso heya se rojan ji çiyê nikaribûna vegeriyana de ci bibana?

Vê ramanê dilê wan hemiyan teng dikir û kêfa wan direvand. Mehmût Xan jî çûyina Hiso bihîst. Ji qehran bû wek dînan. Ci hat devê wî ji gêxê karwanan re jimart. Ji roja şemiyê re ci ma bû ku? Ji xwe çiyayîyan hesp nedidan. şêxê karwanan bi xwe hêre jî, dîsa ew gurên har hespê nadin. Heger bidin jî... Heger bidin jî...

Mehmût Xan, di nav sitûnên rengorengo ê mermer de, di odayê xwe ya sarayê a mezin de dog dibû û diqîriya. "Heger bidin jî, heger bidin jî... Heger hespê bînin li ber deriyê min girêbidin jî, roja gemîyê ez de stûyê wan li birca kelê bidim jêkirin. Ez ê lagê wan jî bavêjim ber segan... Wan ji bo hespekî li hember Osmaniyan ala serhildanê rakirine. Di berbanga sibê a rohnî de xwîna wan de bête rijandin. Xwîna wî kalê pirpitî û serhigk Sofîyê hezar salîjî..."

Hîn waha bû ku êvara roja Pêncgemê Hiso hesp anî, li ber deriyê sarayê ê mezin girêda. Li qezê bû cejn. Herkesî cilên xwe en wegik li xwe kirin. Jinan xeml û xêza xwe girêdan. Gulbahar ji kêfan dîn bû. Bê ku rewga Mémo bîne bîra xwe, bazda, çû nik Ehmed. Ew çend kêfxweg bû ku, bêhêvitiya ku ketibû ser Mémo nedîtibû jî. Çavên Mémo en reg û xwegik bi xemek bêçare ketibûn kortê û ketibûn tenêbûnekê. Di cîhaneke bêdeng de bi tena xwe mabû. Gava ji pigta xwe bi zorê kilît derxist û dirêjî Gulbaharê kir, mirov digot qey bêdest e. Kilît bixwe çûn ketin destên keçikê. Piyên Mémo U hev geriyan. Bi wî awayî Mémo berbi de riyê sarayê megîya. Dema li ber deriyê sarayê hesp dît, pi-

65

çekî hat ser hegê xwe. Hesp li wir wer girêdayî bû. Serê xwe bilind kiribû, bêhna gevê dikigand. Pigtî ku hatibû kesî destê xwe pê nekiribû. Tigt û xeml û xêzên ku li ser wî bûn di tariyê de dibiriqîn. Bi dijminatiyeke pir mezin li hespê nêrî. Heger bi xwe nikaribûna, de gûrek biavêtana hespê û ew bikugtana. Dikir ne dikir ev raman ji mêjiyê wî dervediket. Destê wî li ser destikê gûrê wî, bi raman kugtinê, li dora hespê diçû û dihat. Bi bêhtengî, bi kugtina wî diramiya. Hemû lagê wî mîna ku di avê de bûbe, ji xûydanê gil bûbû.

Û li jor jî, li ser zîndanê, li aliyê gelî, di oda dergevanan a kevin û vala de, Ehmed û Gulbaharê hevudu hembêz kiribûn. Şevê bi ewrekî zêrînî ê evînê, ew nizumandinbûn ke tibûn ber lehiya evîneke mezin, herdû jî ji xwe derbas bûbûn. Di dema mirinê de, evîna dawî, evîna jiyanekê xistibûn gevekê û gavekê. Xwîna wan di damarên hevde diherikî. Agirekî pir germ, lagê wan en tazî gîhandibûn hev. Heger ne U ber mirinê bûna, wekê ne dibûn, di agirê evînê de waha ne digîhagtin hev.

Destê sibê Mémo, ew li jora gelî di cîhê nobedaran ê ke vin de dîtî. Eba Ehmed a ku ji postê pezkoviyan çêbûbû, li xwe pêçabûn û bûbûn cendekek... Usa can bi can. Rohniya hungûrê xwe bera ser wan dabû. Şûrê Mémo tazî di destê wî de bû, ji bêhtengiya dilê xwe, lêvên xwe gez kiribû. û simbêlên xwe quraftibû. Dev û rûyê xwe di nav xwînê de higtibû.

Rûyê Gulbaharê di berbangê de mîna ê zarokekî bextiyar dixûya. Mémo, li beranberê wî rûyî sekinî û nêrî, dilê



xwe bijand. Bêhtengiya wî hînekî çû. Sûre xwe yê dirêj  
pagda vegerand û xist kalanê wî û ji wan bi dur ket. Dîsa çû  
nik hespê. Dîsa bêhna wî teng bû. Li çarmedora hespê dog  
bû, dog bû, di nav xûydanê de ma. Carekê din gûrê xwe ki  
gand. Di destê wî de gûrê wî bibazdan berê xwe da geliyê  
66

jêra serayê, daket, pigtre bilkiğiya. Hat bîra wî ku hemû deriyan  
veke, û hemû kesên sarayê bide ber gûran... Hemî  
kesan... Lingên wî ew kigandin birin zîndanê. Dest bi gûr  
carekê din li devê deriyê holika nobedaran a kevin rawestiya.  
Nuha rûyê Gulbaharê hîn çêtir dihate dîtîn. Lêvên wî  
hinekî ji hev çûbûn diranên wê en sipî weke diranên zarokan  
xûya dikirin. Kortikê honarikên wê hîn xwegtir bûbûn  
û pore wê, rûyê Ehmed vegartibû. Mémo dîsa bi dilbijokî li  
wî rûyî nêrî û ma. Dikarîbû jiyaneke û hezar salî waha bimana  
û li rûyê Gulbaharê temaga bikirana. Le sibe dibû.  
Hindik mabû ku giyar bin. Dema li rûyê Gulbaharê bi heyranî  
dinêrî ji ramanên xwe en ku gev ramiyabû, germ kiri  
bû. Li wê dinêrî, dinêrî, fena ku carekê dîtir de nikaribe  
wê bibîne. Dixwest geklê rûyê wê di mejiyê xwe de bikole  
67

û di regikên çavên xwe de bineqigîne.

Mémo nerm bûyî, germok, carekê din ji wan dur ket, çû  
ba hespê. Ê bi germî dema çavên wî li hespê ketin dîsa  
acîz bû. Page çend carên dîtir hat holikê. Rûyê Gulbaharê  
ê ku her diçû rohnî dibû û vedibû, dilbijokiya Mémo hîn jî  
pirtir dikir.

Dawiyê Gulbahar giyar bû. Di rohnayiya sibê de merivê

ku dest bi gûr hatibû ser wan, dît. Têgihigt ku ew meriv  
Mêmo ye û ci dixwaze bike. Xwe hinekî din nêzîkî Ehmed  
kir. Ev tigt usa xelas bibûna hîn bagtir dibû. Ehmed jî mêrikê  
dest bi gûr dîtibû. Qet xwe nelivandibû. Wî jîxwe nêzîkî  
Gulbaharê kiribû û gotibû, wekê hîn çêtir e. Ji xwe dawiya  
vî tigtî tunebû.

Hilm jî nedikigandin. Di rohnayiya sibê de herdûyan jî li  
bendî gûrê zirav û ku mîna dilopeke ava rohnî li ser wan  
bû, mabûn. Mêmo se caran bi hemî hêza xwe, gûrê xwe li  
ser evîndaran hilda û bi gûnde kigand. Destê wî li wan negeriya  
û gûr li wan neda. Mêmo dizanibû ew wî dibînin ku  
ji bo wê hîn pirtir xwe bi ser hev de didin û bi wê awayî mi  
rinê dipên.

Dîsa çû ber deriyê sarayê, nik hespê, carekê din gûrê xwe  
kigand. Nobedaran, nobeta xwe diguherandin. Bi bez wek  
dînan dest bi gûr, çav bi xwîn, carekê ji hêsp, berbi zînda  
nê, carekê ji zîndanê berbi hesp diçû û dihat. Ji gûrê wî yê  
girs tîrêjên birûskê diçurisîn.

Dawîyê gûrê xwe li kevirê zîndanê ê gîn û xurt xist. Hemî  
xelkê sarayê, hemî xelkê Beyazidê çîrqîniya gûr bihîstin.  
şûr wek kulmek xwê hûr hûr bû. Her parçakî wî çû alikî.  
Mêmo hat holika nobedaran a kevin. Hinekî din li wan  
bi dilbijokî nêrî. Nuha bag nerm bûbû. Bû melekê berê.  
Bi dengê westiyayê: "Dinê rohnî bû, sibe ye, ma hîn  
hûn radikevin." got û ew giyar kirin. Wan xwe bi hev zeliqandibûn.  
Hîna li bendî belakê bûn.

68

"bû sibe , haydê rabin, hin kes de we bibînin... zûka" got

û derket çû.

Herdû evîndar ji bin ewrê evînê ê zêrînê derketin. Gul bahar bi bazdan çû deriyê sarayê. Hesp bêdeng U wir bû. Bi tîrêjên rojê en serê sibê, zîv, sîm, zêrê taximê wî dibiriqm. Gulbaharê bi hemî dilxwegiya xwe, demeke dirêj, xwe li ber roja ku nuh destpêdikir, rakigand Hesp hat. Êdî Ehmed de biçûna. Carekê dîtir jî de nikaribûna Ehmed bidîtana. Hemî bextiyariya wê ya imrekê de di nav vê hezkirina kurt de bibûna. Hemî jiyana xwe de bi bîranîna vê gevê ve derbas bikirina.

Gulhabarê got: "Zor sipas ji vê rojê re, zor sipas ji vî çiyayê birqonek re. Zor sipas ji xwedê re, ev jî besê min e. Zor sipas."

Êdî derûdor bag rohnê bûbû. Ro bi qasî minarekî bilind bûbû. Hemû begên Kurd bi kêfxwegî, hêdî, serê wan li jor yeko yeko, dido dido dihatin. Li pigta wan gûrên wan en gi ran hebûn. Kî dihat pêgî diçû h dora hespê digeriya, li hespê dinêrî û bi awakî nazîkane pagde dizîvirî û diket sarayê. Ji dîwana sarayê a mezin û a pir bi sitûn, dengekî pir bilind û stûr dihat. Mehmût Xan qîrçîr dikir. Ji qehran zer û çilmisî bû, dilerizî û digot:

"Ev ne hespê min e." "Li ber gêx stûyê me ji mû teniktir e, le ev hesp ne hespê min e. Roja şemiyê di dema hungûrê de serê wan de jêbe."

Begê Zîlan, Mustafa Beg xwest bibêje:

"Paga ev hespê te ye. Ez nas dikim." vê gotinê page dîn û harkir.

"Beg, beg ez ji te re dibêjim. Qey tu jî ji wan î? Qey tu jî?"

Begên din gotin: "Page, wî dixwest tigtekî din bibêje. Tu çewt têgihigtî."

"Ez, ez çewt têgihigtim? Hûn dixwazin ci bibêjin? Ez

69

çewt têgihigtim?"

Gotin: "Istexfirillah paga, me çewt tu serwext kirî. Ma tu caran tu çewt têdigihêjî?"

Dawiyê beg bêdeng man. Carekê din jî devên xwe xenekirin. Kêfa wan nîvçe ma.

"Belê gelî began! roja gemiyê, berbangê, serê dizên hes pê min, en ku hespê min dizîn û neanîn, li ber çavên xelkê Osmanî û li ser birca kelehê de bête jêkirin. Ez a nuha bankeran digînim bazarê bera xelkê ji vê yekê agahdar bi kin.

Begên Kurd hemî, li dîwanê li ber page rawestiyan, Dilê wan gikestîbû. Di dilê hemiyan de daxwaza serîhildanê hebû. Bê hevî, bêhevî ji wir derketin. Dîsa li dora hespê çûn û hatin, bag bala xwe danê û gotin:

"Ev hespê wî ye. Welleh, bileh, ev hespê wî ye. Ev nîgan awîye."

Çima paga ji van hersê kesan hêrs bûye? Çima serê wan de bide jêkirin?

Bi ser de jî gotin:

"Bera jêbike" "Neheqî heya qiyametê namîne."

Hemiyan bi hev re qîriyan û gotin "namîne."

Pigtre hemî xelkê qezê bihîst. Banker page derketin bajêr û biryara kugtina wan hersê kesan û sûcên wan xwendin. Hisoyê hesinker ji bîhtengî dîn bû. Bi çakûçê destê xwe

mîna babîzokekê hat ber deriyê sarayê qîriya û got:

"Ev zilm e page. Ev zilm e. Ev zilm weha berdewam nake. Berdewam nake. Hesp ê te ye. Tu ne rewayî wî hes pê yî, le ev hesp ê te ye. Ez derew nakim. Min hesp anî paga ev ê te ye.

Dawiyê hevsarê hespê vekir û hesp berda.

"Paga tu ne rewayê vî hespê yî. Tu ne rewayê mirovatî yî jî paga... Tu, tu, tu ne rewa yî..."

Hesp serberdayî, ket nava Beyazidê, mal bi mal, firoggeh 70

bi firoggeh, li hemî Beyazîdê geriya. Pigtre hat meydana sarayê. Serê xwe bilind kir. Firnikên pozê xwe vekirin. Bi xurtî bêhn kigand. Pigtre jî hîrînîyek lêket. Ew hîrînî usa bû ku erd û ezman pê re hejiya. Hespê delà xwe bilind kir ca rekê du caran weke ku dixwaze bifire, rabû ser piyên pag. Dure bi çargav berê xwe da çiyê. Li qiraxa çiyê wek stêrkekê digemitî.

Kesên ku hîrîniya hespê bihîstin gotin:

"Dawiya wî pagayî nîne.

Celladan kêrên xwe jên giran tûj dikirin, ji bo serê sibê xwe amade dikirin.

Gulbahar dîn û har bûbû. Nikaribû di cîhê xwe de bimîne.

Heya le bû êvar, di nav sarayê de weke miriyan çû û hat. Gava êvar bû û tarî ket erdê, berê xwe da kargeha he sinker. Hiso got: "Em ci bikin keça min, ji destên me tigtek nehat. Ji nuha û pêve nema têt. şêx jî nikare tigtekî bike.

Min jî nikaribû bikira. Li eniya me waha hatîye nivisandin.

Ma em ci bikin."

Gulbahar bêdeng digiriya. Di dilê xwe de digot:

"Ez de axûyê bidim wî... Axûyê mare çiyayê Agirî ê boz de bidimê... Ez ê axukî bidim wî ku ne bide ne bistîne. Di cîhê xwe de bimire. Ez ê nehêlim ew bijî"

Vegeriya sarayê. Li Êsif geriya ew dît. Gelo Êsif nikari bû tigtek bike? Êsif pê re ne peyivî jî. Bi awirên dijminatî li wê nêrî. Ew çend tûj nêrî ku Gulbahar di cîhê xwe de sar ma. Çû nik kizirê sarayê. Bavê wê jî kizir îsmâil pir hez di kir. Ê gotinek wî ne dikir dido. Dît ku kef bi devê Ismaîl Axa jî ketiye. Biryar da ku xwe bavêje ser diya xwe. Nikari bû nêzêkî diya xwe jî bibûna. Di wê sarayê de hemû tigt, herkes, dîwar, sitûnên mermer xaliçeyên kurdan en ku li erdê raxistibûn, je aciz bûbûn. Heya bi pisîka wê ya Wanê, sipî û gira sa ku çavek wê gîne din zerê zêrîn bû, bûbû dijmina wê. Bi nêrînên dijminan li wê dinêrî. Gulbaharê,  
71

pisîka xwe ya ku di nav livîna xwe de mezin kiribû û a ku çavên wê di nav rohaniya zêrîn û gîn de bidiriqin girt hemêza xwe, dest bi girînê kir û got:

"Pisîka min, pisîka min a sipî û a çav zêrîn. Ez ji te re dibêjim, tu serwextî deniê min bibe. Ew de Ehmedê min ê ku min bicarekê dît û wenda kir, bikujin. Ew qertelê çiyayê mezin û evînî dilê min bû."

Bi wî awayî pir peyivî. Di hembêza wê de pisîkê dikir new new. Her diçû bêhêvî dibû. Serê xwe dabû ber dîwarê bêhêvîtiyê, li ber xwe dida, diperpitî.

"Sibe serê sibê de serê Ehmed jêbikin, pisîka min. De wî bikujin, tu dibihîsî? Dilê min digewite, pisîka min. Ez de jî

xwe bikujim."

Pisîka wê di bersînga wê de, bêheg bêheg çû ber deriyê zîndanê. Pisîk germ bû. Her diçû new newa xwe pirtir di kir.

Deriyê zindanê sar bû. Memoyê dergevan pala xwe dabû gûrê û ebayê xwe a ku ji çermê pezkoviyan bû û heya kaboka wî dadidek li xwe pêça bû. Rûyê wî ê xwegikî dirêj, çavên wî en reg, rîha wî ya dirêj û xelek xelekî, ketibûn xe-72

mekê.

Gulbaharê ji pisîka xwe re digot:

"Heger sibê, serê Ehmed jêbikin ez de jî xwe ji gelî bavêjim ser lagê wî."

Ji ser hegê xwe çûbû. Nizanibû Mémo ew gotin bihîstin.

"Mémo, Mémo, te pir qencî bi min kir carekê din min û wî bîne rûbarî hev..."

Pigtre bi dengê nizm, bê hegê xwe peyivî:

"Mémo wî berde bera hère. Ma qey xatirê min li ba te nîne?"

Pisîka xwe avêt erdê û xwe avête destê Mémo. Mémo di cîhê xwe de mat mabû.

"Mémo! Mémo! di destê te de gûrekî mezin heye. Çavên te yen reg wek pêtî ne. Tilîyên te yen zirav wek qeleman e. Zendên te xurt in. Bejneke te ya dirêj heye Mémo. Merivê min Mémo, ev tigt hemû ji dilxwegkirina page pêve kêrî ci hatine? Ev hemî ji jêkirina serîyan pêve ji bo ci kar kirine? Bê serjêkirina mirovan, kêrî ci hatine? Mémo, Mémo, Mémo! Ehmed berde tu ci bixwazî ez de bidim te."

Mémo axîniyeke usa kigand ku Gulbahar, ji dengê wî vecinîqî û hat ser hegê xwe.

"Ez ci bixwazim tu de bidî min?"

'Tu ci bixwazî ez de bidim Mémo, lehengê min Mémo, merivê min Mémo.

Mémo carekê din pirsî: "Ez ci bixwazim tu de bidî?"

Gulbaharê le vegerand: "Cane min bixwaze, cane xwe didim Mémo.

Gulbaharê nikaribû tirsî ku di dengê wî de ye vegêre.

Dîsa got: "Ci bixwazî ez de bidim Mémo. Ci bixwazî... Hew bera Ehmed rizgar bibe."

Mémo bêdeng ma. Nema peyivî. Ramiya. Rûyê wî li ber rohniya kêmbi dilxwegî geg bû. Pigtire Mémo bigirî. Destê xwe dirêj kir. Linav porê Gulbaharê gerand. Dilê wî nedigirt

73

ku dest bidiyê. Gulbahar bi hemî lebatên laga xwe U bendî daxwaza Mémo bû. Dengê Mémo ne wek berê bû. Mémo bextiyar û bi kêf bû. Bextiyarî je difûriya. Wek merivê ku li cîhanê gihagtiye hemî miradên xwe, bêdeng û bikêf bû.

Got: "Ez ci bixwazim tu de bidî?"

Gulbaharê bi dengê rehet û bixwe bawer bersîv da.

"Belê ez de bidim."

"Çend mûyên pore te dixwazim."

Gulbaharê bê ku birame, destê xwe avêt keziyeke xwe û dirêj kir, got:

"şûrê xwe bigîne, jêke Mémo Gulbahar bigorî."

Mémo gûrê xwe kigand, ji serê keziyê piçek jêkir, girt danî ser dilê xwe û got:



'Tigtgekî din dixwazim."

Gulbaharê bi lez gotê: "Bêje Gulbahar bigorî."

"Dixwazim, Gulbahar, vê gevê û min, heya mirina xwe ji bîra neke."

Gulbahar xwe avêt destê wî, Mémo xwe ji nav lepên wê derxist û berê xwe da zîndanê.

"Ehmed, Mûsa Beg, Sofî giyar bin"

Hersê jî ne razayê bûn. Rabûn ser piyan. Mémo zincîrên wan vekirin.

"Hûn de jî deriyê jêrîn derkevin. Heya berbangê wextê we yê revê heye. Heya wê gavê birevin û azad bin."

Ehmed li ber derî Gulbahar dît. Ew hembêz kir. Gulbahar:

"Zû, zû, zûka. Hindik maye, derûdor rohnê bibe. Legker dé bikaribin we bigirin."

Ehmed ew berdaji deriyê zîndanê êjêrîn derketin derve. Ew çûn û ne çûn Mémo jî wenda bû. Gulbahar li wî ge riya negeriya, ew ne dît.

Cîhan rohnê bû. Tîrêjên rojê bi awakî xemgîn, kêrn rohnê û bêkêf di kêleka çiyayê Agirî re daketin, ser bajarê

74

Beyazîdê û sarayê.

Cellad gîhagtin zîndanê ji Mémo re gotin:

"Mémo derî veke û wan se kesan ji bo birînê amade bike".

Mémo weke ku tigtek nebûye, bê deng û devbiken got:

"Min îgev ew berdan."

Celladan bawer nekirin û ketin zîndanê ku ci bibînin, ji

wan kesan yek jî li hundur nemabû. Bi lez çûn nik page. Hemî tigt je re gotin. Page destê xwe avêt gûrê xwe û raste rast çû zîndanê. îsmâîl Axa, serhêz û peyayên wî en ku li wir bûn, hemiyar destên xwe avêtin gûrên xwe. Page li pêg ew li dû wî çûn zîndanê. Mémo bi tena xwe gûrê xwe vekir û pêgginiya wan kir.

Mémo bi ken got:

"Îgeve min ew berdan pagayê min. Ma min bag nekir? Min got heye ku bi vê kirê tu dilxweg bibî."

Paga qîriya û got:

"Seg nanê min li te heram be."

Û êrîgî Mémo kir. Peyayên wî jî êrîgî Mémo kirin. Şerekî hêja destpêkir. Yekî ji wan jî nekiribû nêzî Mémo bibe.

Hin bi hin çarmedora Mémo bi kesên ku gûrkeg bûn tije bû. Û dora wî girtin, gûrkêg pir dibûn. Mémo bi ger heya birca kelehê, cîhê ku serê wan de îro û di vê kajmêrê de li wirjêbibûnahat.

"Paga, paga" "Min dikaribû, bi we re li vir se gev û se ro jan ger bikirana. Le ci fayde... Ez ji cîhanê ter bûme. Tigtê ku min dixwest, min bi dest xist. Ez ji cîhanê, têrbûyî diçim. Min çend meriv kugtin de ci bibe? Hew çend koleyên te kêmbin, ne waha? Di xwegiyê de bimînin. Ji dostan re, ji dijminan re, ji kesên ku ji min hez dikir, nakin, ji kesên dijmin re silavan dikim.

Xwe ji birca kelehê avêt jêr. Gelî pir kûr bû. Dema mirov ji jor de le dinêrî, Mémo wek miriyê teyrekî ku baskên

75

xwe vekiribû, xûya dikir.

Berî herkesî, Hisoyê hesinker hat ser lagê Mémô. Di pey wî re lawên wî hatin. Pigtre jin û keçik... Fîxanek ket nav bajarê Beyazîdê.

Hiso hêdî berbi Mémô ve çû, ji aniya wî, ew maç kir. De stê Mémô ê çepê girtî bû û li ser dilê wî bû. Hiso bi destê Mémô girt û bi destên xwe en bi hêz, destê wî bi zor vekir. Çend mûyên reg di destê wî de wek bizotê reg dibiriqîn. Û wegiyan ser axa kê m çîmen.

Ûsif dil bi tirs, bala xwe dida hemû bûyeran. Ûsif xwîna ku bi axa çîmen tevlihev bûbû, dît. Hesp rabûbû ser herdû pîyên dawî. Hemiyar dizanibû hesp ê bavê wî ye. Çima bavê wî qiyama xwe bi hêsp ne anî? Gelo, hayê bavê wî ji her tigtî hebû? Tigtên ku Gulbaharê kiribûn? Ma ji ber wê? Wî her tigt dizanibû. Ma dibû ku edî nizanibûna? Ew pigt dîwarên qalîn dibîne. Peyvên ku li cîhê dur derbas di bin, dibihîse... Ma ne waha ye? Tigtên ku Gulbahar dike, hemiyar jî zane. Ma Mémô çima xwe kugt? Ji tirsaxwe, xwe kugt. Ma nikaribû bireviya? De bireviya ku? Bireviyana çiyê. Ma nikaribû xwe bavêta keheha Xogabê? Bireviya ku, dîsa page de ew bida girtin û post bikirana. Dema ku hîn Ûsif î biçûk bû, carekê li meydana bajêr merivek çîp tazî kiribû, hew cîhê wî yê heram girtibû. Pag û pêg li kerê suwar kiribû û gerandibû. Serê kerê wî yekî çavsilpokî û mijank wegiyayî dikigand. Li cîhê mijankên wegiyayî gogtekî sor mabû. Şîlaqa çavên wî ketibû ser rûyê wî. Li herdû kêlekên kerê du merivên pir girs hebûn. Di destê yekî de kêrekê mezin bi xwîn di destê din de xencereke biçûk î birqonek... Weke ku nuha h ber çavên wî ne, dihat bîra wî,

merivê, dest bi xençer destên xwe dirêjî guhê mêrikê ser kerê, ê ku kom bûbû û destên wî bi werîs girêdayî bûn, ki ribû û guhê wî yê çepê bi kêrê jêkiribû. Pigtre carekê li guh, carekê U xelkê nêrbû û keniya bû. Merikê guhjêbûyî  
77

bi êgeke pir mezin qîrîyabû û tertilî bû. Benê mûyîn li ser destên wî kortik çêkiribû. Ji cîhê guh, xwîn dihat. Cellad guh avête nav xelkê, di ser serê xelkê re guh ket nav firoggehekê. Firogkar yekî girs, poz nikilî, rîhreg û qelaw bû. Li guhê bi xwîn ê ku ketibû hundur nêrî, gag ma. Te digot qey avsinîbû. Li guhê ku xwîn je dihat, bêdeng dinêrî. Ne dilebitî û çavên xwe nedigirtin.

Ker di nav xwînî de ma. Merivê ku di destê wî de satir hebû, bi satira xwe ya tûj ev meriv post dikir, wek mîhan digurand. Ji qêrîna pir, dengê mêrik ketibû. Qirika wî xirxir dikir. Pir kes kom bûbûn. Rûyên merivan ne ewçend bi tirs bûn. Pigtî nivro mêrik anîn, avêtin ser kevirên ber ke lehê. Her xwîn je diçû. Hemî qeza, bi mal, firoggeh, kargeh û riyên xwe bûbûn xwîn. Ji nav axê, xwînê diavêt. Wê gevê heya sibê Êsif xwîn veregîya. Hemî zarokên qezê jî xwîn veregyân. Xwînê kef dida. Diya wî li ber serê wî rûnigtibû, digiriya. Bavê wî digot: "De fêr bibe, tu de jî fêr bibî. Li vê cîhanê bi awakî din meriv rehet najî..."

Diya wî bêrawestî digirîya. Bêhegketina wê tê bîra Êsif.

Pigtî wî merivî, Êsif pir caran, merivên ku bi wî awayî pagûpêgî li kerê suwar bûyî dîtî. Mûyên wî jî ne leqîyan. Li ber çavên Êsif pir serî jêkirin. Li keleha Beyazidê... Bi

zincîran, li pir merivan xistin. meydana Beyazidê dema ew tigt dibûn, bavé wî sergêj dibû. Rûyê wî vedizeliya. Çavên wî dibiriqîn. Bejna wî dirêj dibû, polên wî fireh dibûn.

Dibû wek merivekî din. Di demên welê de mirov digot qey bavé wî bûye xwedê ê ku çêdike û ê ku xerab dike. Bavé wî di wan deman de dibû wek xwe ilahê tirsandinê ê ku ji çiyayê Agirî bi hezàran deng û birûskan ve daketibû.

Ûsif ji wî pir ditirsiya, bavé wî ji bo wî ne bavek bû, tirsek bû.

Wê gevê heya sibê raneket. Her ku xewa wî ne dihat, ew 78

çend tirsê wî pirtir dibû. Sedî sed bavé wî dizanibû, Gulbaharê doza hespê ji wî re gotiye. Ew li hêvîya hêvîyeke bag bû. Tu caran wî, hîssên xwe diyar nedikirin. eskirin, dijminatî, bêhtengî, tirsîn û netirsîna wî ji rûyê wî dîyar nedibû.

Ez ji vir birevim, biçim keleya Xogabê, xwe bavêjim dest û lingên begê Xogabê, bêjim min mede bavé min, heger tu nikaribî min vegêrî min bigîne vê cola jêrîn, cîyê ku keriyên ahû té de diçêrin, bigine nav Ereban. Ramiya, got, beg jî je ditirse. Ji bavé min... Ji bavé min herkes ditirse, şahê îranê, Padigahê Osmanî, herkes herkes ditirse. Hew ew Gulbahara mirdar natirse. Hisoyê hesinker û şêxê karwanan jî je natirsin. şêx je ditirse, le bes ew herdû natirsin.

Ûsif bi zor ew gev derbas kir. Heger bavé wî bibîhîse ev îş bûne, dé bibêje, lawê min jî, li ber min serî hildaye. Û hayê min nagihêne. Êdî divê ez bimirim. Yan jî divê ji bo îbretî lagê wî bigurînim û çavên wî derînim ku... Yan jî divê ez bimirim, bibêje...

Gava bû sibe Êsif hîn pirtir tirsîya. Her li bendî celladan bû ku werin destên wî girêbidin û bibin. Ha nuha... Li qira xa kêlê odeyeke biçûk hebû. Têra se kesên ku li ser lingan rawestiyabin, fikir. Hema ket hundurê wê odê. Guhên wî li deng... Digot qey a nuha li hemî aliyê sarayê li wî digerin. Li nav sarayê de bigerin, wî nebînin, îcar de siwariyan derxînin ser rîyan. De bibêjin lawê page reviya ye. Hemû cîhan de li hev biketana. Babet babet gotin de derketana. Rîwayet de...

Bi tirs li wir ma. Ji qeliga derî, piçek rohnî diket hundur. Rohnî, zer, çilmisî bû û kêlê bû. Pigtre di nav tariyê de wenda bû. Êsif axînek kigand. Îro jî xwe rizgar kiribû. Pêl serê tiliyên xwe kir û ji odê derket. Di ber wî re peyayê ke lehê bê ku le binîrin bi edeb, pête avêtin û derbas bûn. Êsif li dilê xwe de got, ev kemîn e. Kemina bavê min e. A nuha de min bide girtin. A nuha... Guhê wî, kutkuta dilê wî,  
79

dibihîst. Ji birçîna qurqura nava wî dihat bihîstin, çû agpêgxanê. Li derudor bêhna êvara biharê dihat. Hilmek tû a kulîlkekê ji dur ve dihat. Pozê wî bi bêhna gogtê pijiyayî gewitî. Kesên ku li agpêsxanê dixebitîn, dema Êsif dîtî rabûn ser piyan. Êsif hinekî li wir çû û hat. Le ji german ji wan xwarin nexwest. Ê li wir nexwar. Ji dîwarê dengê bavê xwe yê hîgk û dagirtî dihate bihîstin. Ê ji nigka ve, mîna ku bi kêlê were birîn, deng sekînî. Bêrawest, Êsif ji agpêgxanê derket, çû eywanê. Li cihê nobetê, nobedar bi simbêlê xwe yê pirûz waha rawestiyabû, nedileqiya. Êsif ji wir derbasî mizgefta kelê bû. Wek dehbeyek hov ku ji dehbekî din bireve,

hat wir û bêhna xwe berda. Pigtre çû cihê jinan. Diviyabû hemî tigtî ji diya xwe re bigota. Ji xwe ji birçîna diket, diviya ter xwarin jî bixwara.

Dema dîya wî ew dît, tirsiya û pirsî.

"Ci bi te hatiye Êsif?" "Tu nexweg î?"

Êsif bi nalîn got: "Ez nesax im." Ê xwe avêt ser nivînê.

Di nav êgir de digewitî. Êsif se gev û se rojan bêhig dipeyvî.

Bijîgk anîn ser. Bijîgkan derman danê. Destên wî

hatibûn girtin venedibûn. Pigtî se rojan Êsif çavên xwe vekirin,

destên wê jî sist bûn, tiliyên wî vebûn. Page rabû ser

xwe mîna ahuyekî tirsoyayî bû. Heya êvarê li kelê çû û hat.

Çare tunebû. Diviya biçûna, hemî tigtî weke dizanibû ji

bavê xwe re bigota. Ji xwe bavê wî her tigtî dizanibû. Bi ca

rekê re Gulbahar hat bîra wî. Ew pir yaman bû. Wê jî zanbibû

bavê wê hertigtî zane. Dibe ku ji xwe re riya

rizgarbûnê amade kiribû. Hema bi lez çû aliyê jinan, oda

Gulbaharê.

Gulbahar rûnigtibû, çerx dirêst. Ji çerxê nalînîn kûr û di rêj dihatin.

Çerx Êsifî dîn kir, heya ji wî hat qîrîya, got:

"Gulbahar." Dengê wî bi zor derdiket. Bi tirs bû. Gulba

harê bi nermî pirsî: "Ci ye Êsif?" bêdeng bû.

80

Êsif: "Bavê min dé çavên me derxîne. Me post bike.

Bavê min her tigtî zane".

"Ma te je re got?"

"Min ne got le zane. Dé çavên me bikole. De bikole

Gulbahar!.. dé bikole!.."

Gulbahar: "Kêgotiyî?"

"Ew zane, em birevin erê. em birevin?"

Xwe avêtibû himbêza Gulbaharê, çimên xwe ramedandibûn.

Çena wî dilerizî. Ew bûbû mîna ço.

"Ew zane Gulbahar, em birevin!"

"Em birevin ku?"

"Hema ku derê bû. Ew dizane"

Gulbaharê ew danê ser Sedîrê. "Hele raweste." got "Em birevin ku? Hele raweste"

Ûsif "Bavé min ji te re kemînê datîne. Naxwaze haya te bigiyêne ku ew her tigtî zane, anîna hespê, çûyina te ya kargeha hesinker, min jî dît tu derbasî kargeha hesinker bûyî. Bavé min vê jî dizane. A Ehmed jî dizane. Her tigtî dizane. Ew dizane em li vira nuha waha dipeyivin jî. Wî her tigt dîtîye û ew her tigtî zane. Heger em nerevin, bavé min dé çavên me derxîne. Gava ji îsmaîl Axa re digot, min bi guhê xwe ve bihîst."

"Ci digot".

"Digot ez dé wê keçê û wî lawî bikujim. Ez dipêem ku ka, Ûsif dé were her tigtî ji min re bibêje yan na? Gulbahar de were xwe bavêje lingên min yan na? Ezê îro jî bipêem... Lé sibê ez dé wan bigirim..."

Gulbahar serwextî her tigtî bû. Wê jî bi salan ew yek waha dizanibû. Bavé wê dixwest di mejiyê hemiyana de ba weriya ku ew her tigtî dibîne û dizane, pêk bîne. Ji vê baweriyê xelasbûn jî pir dijwar bû. Mirov çiqasî mejiyê xwe bikar bîne jî, dema ku ev bawerî di mejiyê wî de bi cîh bûbûna, nikaribû xwe ji wê rizgar bikirana. Heger îro Ûsif



negotana, sibe de hemî tigt ji bavé xwe re bigota. Yan jî ji tirsâ dilê xwe dé birnira. Ji ber ku Êsif nuha ne li ser hegê xwe bû hatibû vir. A dûyim jî heya nuha neçûna nik bavé xwe jî, ji tirsâ wî bû. Gulbahar, li ser her tigtî yeko yeko ra miya. Heger Êsif biçe nik bavé xwe, doza hespê û hesinker ji wî re bibêje, de her tigt bête zanîn. Ê bavé wê dé bizanibûna, wê zîndanî dane revandin. Him de jî bizanibûna kê Mémô gand mirinê û Mémô ji bo ci usa kir. Mémô ji bo ci welê cane xwe dida? Ma bavé wî dé ev yek dernexistana? Ji nigka ve Êsif zer û higk bû û got: "Ez diçim".

Derî girt û derket. Bi bazdan hat ber deryê dîwanê, wekî dînan, xwe avêt destên bavé xwe. Li dîwanê du begên Kurd îsmâîl axa, subagî, du bekçiyên gevê û çend derwêgên ku ji dur ve hatibûn, hebûn.

"Bavo min biborîne, min mekuje, çavên min mekole, ci dibe bavo! Te hemî tigt dît û dizanî. Min biborîne. Min ji te re xinizî ne kir. Min biborîne..."got.

Bê rawestîn û bêhn çikyayî, çawa Gulbahar hatiye nik wî, û çawa je kar xwestiye, çawa çûye nik hesinker û gêxê kar wanan gîrova vekir û ji ku ci bihîstibû je re got û bi ser de jîgot:

"A nuha jî xwe bigihênin. Gulbahar direve. Gulbahar reviya."  
 Ji nigka ve di mejîyê page de, hin dîtinên nuh peyda bûn. Hemû tigt li ber çavên wî rohnê bû. Dikir ne dikir hoyâ xiniziya Mémô peyde nedikir. Peyde nedikir, ji lewra ji êga xwe, ji acizîya xwe û bêhtengiyê dîn dibû. Ji ber ku, bi qasî ji lawê xwe hez dikir, ewçend jîji Mémô hez dikir.

Herdû milên wî mîna baskên qertelan vebûn, rabû ser piyan. Zer bû, lerizî, du gav avêtin, heger xwe bi diwêr ne girtana de biketa. Rûyê wî sipî bûbû, lêvên wî zûha û qeligî

82

bûn. Rîha wî lerizî. Di pey re pagpagkî kumigî ser text.

Destên wî çûn paxila wî.

Bê îsmâîl axa en din derketin derve. Êsif ketibû ser sedirê û mabû.

Page got: "îsmâîl" "îsmâîl ev ci ye hat serê me? Bêla namûsê jî de bihata serê me? Vê keçî ev tigt de jî bianiyana serê min? Dêmek Mémo ha? Xûya ye, vê fêlbazê devê Mémo girêda. Dêmek vê keçê navê malbata min xerab kir, gerefa min daxist pêne peran. Pir bêla hatibûn serê vê malbatê, le ev bêla nehatibû îsmâîl! Em bêhay girtin. îsmâîl, bera haya kesî ji vî tigtê ku hatiye serê me nebe. Di welatê Osmaniyan ê mezin de ez ê riswa bibim. Dêmek waha ha, îsmâîl! Le ez têngahê îsmâîl, ev keç evîndara kê ye? A Ehmed e? Yan a Mémo ye? Mémo? Mémo?

Mahmût Xan fikir, nedikir ramana din a ku dihat bîra wî, rewayî xwe û keça xwe ne didît got:

"îsmâîl, û rabû ser piyan "Divê tu kes vê yekê ne bihîse.

A nuha em nikarin ji keçikê re tigtekî ji bikin".

îsmail got. "Nabe, xelk de bi Mémo ve girêbidin."

84

"Em ci bikin, bi vê keçê îsmâîl? carekê bêje?"

îsmâîl got: "Çareyek."

Bîstik dirêj bêdeng ma.

Mahmût Xan: "Em xwe li nezaniyê bixin. Weke ku me

nebihîst û em nizanin, bag e?"

Îsmaîl axa got: "Nabe, em bi tu awayî nikarin wê di kele hê de bêhêlin. Ew ê bireve. Yan bi dizîkan em wê bikujin, yan jî bavêjin zîndanê. Ew bîra ku me Elî Beg avêtibûyê..."

Page got: "Dibe, le divê merivekî saxlam deynî ber deran na..."

"Ez ê deynim pagayê min".

Hêdî hêdî hegê page dihat serê wî. Doza hespê, strana Sofî, hertigt, her tigt êdî ronî bûbûn. Hemî tigtên ku bûbûn, vekirîbûn. Diviya pêwendiya Ehmed û Gulbaharê jî pir ke vin bûna.

Îsmaîl axa pir bilez derket. Tevî du merivan ket oda Gulbaharê. Pigtî derketina Êsif, Gulbahar li hêvîya hatina celladan û Îsmaîl axa mabû. Ji bo her tigtî amade bû. Îsmaîl axa Gulbahara ku li ser lîngan, çîk rawestîyabû, ganî wanda. Herduyan ew girtin. Îsmaîl axa li pêg, en din li pag gîhagtin ber cala zîndanê. Li hundur kesek tunebû.

Îsmaîl axa di qedir de kêmanî nedikir got:

"Xanimê daxin jê".

Gulbahar bi xwe daket. Îsmaîl axa bi destên xwe derê ki lît kir û kilît girt nik xwe.

"Hûn herdû jî de li ber vî derîyî bin. Serê we biçê jî ev keçik de ji vir dernekeve."

Page jina xwe anî û hemî tigt je re got. Di pey re Êsif nîgan da, Êsif ketibû erdê û ranebûbû û got:

"Di lêwik de hal nemaye. Rewga wî yekcar ne bag e. Bala xwe bag bidê. Ji te pêve kesek de cîhê vê keçikê de nizanibe. Heger Êsif li ser hegê xwe be, ji wî re jî bibêje bera ji

keskî re nebêje."

85

Page Ûsif ji erdê rakir. Li kêleka xwe da rûnandin. Bi gorê wî lîst. Hêdî hêdî Ûsif dihat ser hegê xwe. Page je re digot: 'Tu lawê min ê mêrxas î. Lehengê ku rewayî malbata xwe be, waha dike. Û nahêle namûsa wî bikeve bin piyan'. Çavên Ûsif ji gagbûnê wek piyanan vebûbûn û pirsî: 'Tu de min nekujî? Tu de çavên min dernexînî?'

Page aniya wî maç kir û got: 'Tu ci dibêjî? Ji bo vî çêyî û qenciya te ez ê hespekî û çekeke ku tu dipesinînî ji te re diyarî bikim. Ci dibêjî tu? Ji bo ci ez de te bikujim?'

Ûsif digiriya.

Page ji jina xwe re got:

"Xatûn lawik bibe. Ne User hegê xwe ye. Pir tirsîya ye".

Jinik ket bin mile Ûsif û ew i dîwanê derxist.

Bi derketina wan re îsmâîl rehet bû got:

'Temam e, page min".

"Kes de nizanibe. Kes de nebihîse ne waha îsmâîl axa?

"Ser seran pagayê min".

"Ez nuha rehet bûm îsmâîl axa. Min dikir nedikir ev tigt ji hev dernedixist. Serê min tevlihev bûbû. Bera hinek dem derbas be, em dé li çareya serê keçikê binêrin îsmâîl."

"Em de mêzebikin, pagayê min. Ew hêsan e. Hela bera wext derbas bibe û her tigt were jî bîr kirin.

Tevî ku wan ew doz vegartî higtin jî, di demeke kurt de, hâte bihîstin ku Gulbahar avêtine bîra zîndanê. Pêgî kese kî bawer nekir. Hisoyê Hesinker û şêxê karwanan jî bihîstin. Ji xwe wan, ew yek dipan. Pigtre xeber li car aliyê Agirî

belav bû, gîhagte dora gola Wanê. Gihagte Erzurumê,  
Qersê û Erzîncanê. Evina Ehmed û Gulbaharê ji bo xelkê  
bû destan. Dengbêjan, li ser keçika ku di cala zîndanê de  
ye, stran çêkirin. Bilûrvana û givanan maqamê stranên danîn  
û hemî çiyayîyên Agirî ketin ginê.

Xortan, lehengan, jinên ter evîn, hemiyên gotin:

"Heya ew li wir li çalê bimîne, em ê çawa bikaribin li

86

rûyê hev binêrin."

Bi gevan, xew nediket çavên Ehmed, şêxê karwanan,  
Hiso û hemî xelkê derûdora çiyayê Agirî û degta Erzurimê.  
Di dilê wan de êga wîcdanê, germ û bêhtengî wek birînekê  
heroj geg dibû.

Mirov dibêje qey, çiyayê Agirî cîhaneke bi serê xwe ye.  
Giran û bi heybet. Pir caran serê çiyê bi mij e. Hin caran jî  
cîhê ewran bi stêrkên bêla wela tije dibe. Ew stêrkên ku di  
bahozê de kom kom digerîyan. Li pag gevên dirêj, tav wek  
parçekî êgir sor, ji nav zikê Agirî derdikeve.

Bi gev çiyayê Agirî hîn pirtir giran, mezin û bi heybet  
dibe, meriv dibêje qey, cîhan bes li Agiriyê ye. Gumîne  
bêdengî ya gevê xerab dikir. Ji alîkî heya alîkî. Dema tenha  
dibû, Agirî dikeliya. Di gevên tarî de, Agirî di nav tariya  
gevê de wenda nedibû û nediket rengê gevê .Di gevên taride,  
ew dibû cîhaneke ji gevê hin taritir û li ser cîhanê sîdar  
dibû.Li ber rohaniya heyvêde wek birqînek tenik dihejiya.  
Bi gevê tirs dide dilê mirovan.Reayiya wî mîna qirê ye.Di  
gevên tarî û bêstêrik de, ji çiyê dengên hummînê têt. Den  
gên usa mirov dibêje qeyli kûraniya hezar salan derdikeve.

Tarîya fena kevirê giran û wek dîwêr... Weke ku Agirî dimegiya. Herder bêdeng bû. Wek bêdengiya beriya qiyametê bihnekê...Û gev, taritî dest bi megê kir. Çermê Agirî ê qalîn dest bi himînê kir. Dawa gevê, bihêrs û bibiryar dimegiya. Di ezmên de hîç stêrik tunebû. Li pêgî li ser hes pê, Ehmed, û pigtî wî jî mirovên Agirî... Mal, xanî û gund vala bûn. Ew çend mirov, bi kevirên ku di dema pêlkirina wan de ji ber lingên wan diketin jêr, ber bi saraya Beyazidê dimegiyan wek pêlekê daketin ser Beyazidê.

Di wê gavê de li qiraxa Wanê jî xelk giyar bûbûn. Gun dên degtê jî... Ew jî herikîn ser Beyazidê. Ew qelobalixa ku wek baranê ku ji ezmên dadiket û wek mêrûyên ji bin axê derdiketin, bi gevê re û bi Agirî ve megîya ser sa

87

raya Mehmût Xan.

Dema tav ji pag hêtek Agirî serê xwe derxistibû, car car ran wenda dibû, car caran jî xûya dibû. Mehmût Xan ji pencereya saraya xwe, xeyal meyal qelobalixek dît. Dît ku meriv dimegîn. En ku siwar in en ku peya ne. Hinekan postê xezalan, bizinan, berxikan û cahniyan li xwe kiribûn. Hinekî wan bejn dirêj, esmer, por zer, çavgînî tarî, gewrî dirêj, zend xwegik û çav girs bûn...

Çiqas rohnî vedibû, qelobalix, weke ku ji bin mija belav bûyî, hiêdî hêdî derdikeve, ji bin baskên tarîtiyê derdiket. Gava Mehmût Xan qelobalix dît, bi çavên xwe bawer ne kirin. Çavên xwe girt û vekir. Ehmed li ser hespê bû. Bi ca rekê bêhna Mehmût Xan teng bû, U derûdora xwe nêrî, xwest fermanekê bide, devê wî zûha bû, pigtre ramiya. He

ger ew qezeya Beyazîdê bi ax û kevirên xwe hemî bibûna legker jî, de li hember vê qelebalixê ci bikarana? Serîkî wê li degta Beyazîdê, ê din nêzîkî serê çiyayê Agirîyê...

Qelebalix hêdî hêdî çû ser sarayê. Wek mojleyan... Qet ji yekî deng dernediket. Ji yekî jî... Bi carekê zîqînîyeke me zin hâte bihîstin. Ew deng, dengê deriyê sarayê bû. Derî vebû, qelebalix ket hundur. Dîsa bêdeng û hêdî hêdî ber bi zîndanê ve megiyan. Îsmâîl Axa Gulbahar ji zîndanê der xistibû, li ber derî dilerizî. Gulbahar U ber ronahiya rojê çavên xwe digirtin û vedikirin. Gulbahar bi çavên xwe yen ku li ber rohnîyê venedibûn,, nikaribû serwextî tigtên ku dibûn, bibûna. Tenê dizanibû ew cala zîndanê derxistine. Qelebalixê dîsa hêdî, bêdeng, Gulbahar girt û ji deriyê sarayê derket.

Li wir, li nêzîk, li ba gora Ehmedê Xanê agirekî mezin dadabûn. Derwêg û Sofîyên ku li wir bûn, li ser sofîyên ku bi qasî bênderekê bûn, demigiyan. Mirîdên ku li dora êgir gor girtibûn jî, ji wan re qesîde dixwendin, zikir dikirin û li bilûrê dixistin. Qelebaxlix dîsa bêdeng li dora bêndera êgir

89  
kom bû. Dora çiyayê Agirî tije mirov bûn. Ji pir dur ve en ku li ser êgir dimegiyan xûya dibûn. Lagên derwêgên ku li ser êgir dimegiyan en bi xwêdan û tazî, ji nav bizotên ku diçirisîn xûya dikirin Xwêdanê wan weke avê diavêt.

Mehmût Xan digot: "Ez tirsok im".

şûrê wî di destê wi de bû û dixwest bi tena xwe êrîgê qelebalixê bike. Îsmâîl axa û en din ew bi zor girtibûn.

Mehmût Xan digot:

"Ji îro û gûnde mayînji ci re ye?" digot û dinaliya.

"Min navê Osmaniya ê mezin anî pêne peran... Li ber ça vên xelkê ez riswa bûm. Heger saray vê yekê bibihîse de ci bibe? Ji îro û pêve ez bijîm jî ci re ye?"

Le ci qelebalix, ji wê qelebalixê re hêz ter nake ku...

Ordî jî nikarin bi vê qelebalixê re derkevin serî... Ev hesp jî ci bêla bûye. Mehmût Xan diramiya û di dilê xwe de digot: "Gelo ev bêla û ev doza hespê gigk karê xwedê bûn.? Qey xwedê usa dikir?"

Qelebalixê heya roj çû ava li wir li ser gora Ehmedê Xanê gahî kir. Li defê xistin, derwêgên nîvtazî li ser êgir bi porên xwe yen gijbûyî, bi lez diçûn dihatin. Dest û lingên wan li hev digeriyan. Xort, keç û jinan govend digerandin. Ew çend xweg dilîstin ku heya nuha kesekî lîstikeke usa nedîtibû. Dirêjiya govenda ku xort û keçan girêdabûn, gihagtibû heya sarayê. Heft def û heft zirna li yek maqamî dixistin û ancax ew govenda dirêj digerandin. Pêgmalên ji nan ji hevrigîm çêbûbû. Kofiyên wan wek tavê dibiriqîn. Govend, mîna deryayek ku hatibû li qûntara çiyayê Agirî pêldidan, hin caran pêl diherikîn, bilind dibûn, hin caran jî dadiketin, zirav û hûr dibûn.

Gulbahar birin mala hesinker, gugtin. Ji cawê lahûrî celekî ê pêgiyan, kevn û xwegik ê ku mirov digot qey, derzî ji ser ne çûye û wek ê nav çîrokan lêkirin. Dawiyê ew li hespê bavê wê siwar kirin, birin mala şêxê karwanan. Ji 90

Ehmed re hespekî din anîbûn.

Ehmed û Gulbahar gêx tewaf kirin û kala wî maç kirin.



şêx jî ew maç kirin û pîroz kirin. Mehmût Xan, hin tigt bi çavên xwe dîtin. Tigtên ku nedîtin jî dawiyê je re yeka yeka gotin.

şêx got ku: "Mehmût Xan Osmanî ye, kafirek e. Ew en ku wek wî ne mîna mirovan in. Vê yekê ji me re nahêle. Ew ê belayekê bînin serê Agirî. Tigtekî nekin jî ew ê zarûzêçan bikujin. A duyim jî, bera tore bi destên me xerab nebin. Ehmed tu nuha Gulbaharê bigire û rasterast biçe keleha Xogabê, nik beg. Ez ê bi te ra xelîfeyê xwe Birahîm jî bigînim. Begê kela Xogabê, Ibrahim nas dike. Herin bera begê keleha Xogabê karê we biqedîne. Ew rnirîdê min e." Toreyeke kevin hebû. Gava xortekî keçek birevanda û xwe biavêta pag hinekan, bavê keçikê kî bibûna jî, xwe diyê malê keç nedidayê. Biçend biha rûnigtana ser wan jî, dé bavê keçikê bianînan rê, qelena wê bidanayê, daweta wan bikira. Ji rûyên keçên ku bi vî awayî dihatin revandin, pir xwîn rijyabû.

Naha Gulbahar û Ehmed diçûn nik begê keleha Xoga bê. Begê keleha Xogabê, begekî ku bi Osmaniyan, nîv girêdayî bû. Ev keça revandî ne keça Mehmût Xan bûna, keça padigahê Osmaniyan jî bûna, dîsa begê Xogabê ew ji devê deriyê xwe venedigerandin. Toreya begîtiyê rê li ber vê digirt. De ger bikira, serê xwe bidana, begîtiya wî ji destên wî biçûna, lî ê keç û xort ne didan dest. Yan na, di nav gel de riswa dibû û kesekî li rûyê wî nedinêrî.

Keleha Xogabê, li rohilatê gola Wanê, li ser riya karwanan, li ser çiyayên ku ji degtên bilind xûya dikirin, ava bûbû. Dora wê bi sêrê gûrên xurt û xwegik girtine. Ji binê

wê ava xogabê a zelal diherikî. Kesekî nizanibû kengî keleh çêbûye. Keleh ji sed salan vir de ava bûbû. Di her demkê de parçeyek xistine ser, xistine ser, le her ci parçekî nuh

91  
lé zêde kiribûn jî, yekeriya kelehê xerab nebûbû. Begê Xogabê di xwegiktirîn keleha cîhanê de rûdinigt.

Ehmed û Gulbahar li biné zinara kelehê ji hespên xwe daketin. Hesp h' jêr, xistin axirê legkerên begê gund. Gava nobedar, îbrahîm dît, je re dua kirin û ew birin kelehê.

Pigtî ku Beg hemî tigt ji devê îbrahîm guhdarî kir, gotê: "Ev Mehmût Xan tore more nizane. Ew ne beg e, ew pa gaye ew Osmanî ye. Heger bibîhise zarok hatine vir, de legkerên xwe bîne ser me. Em ci bikin. Dema hat em ê rasterast keçê bixwazin. Hemî mal û heyînên xwe em dé bidin û keçikê ji Ehmed re bistinîn. Fermana şêx li ser serê me ye. Em ê cane xwe jî bidinê".

Û destên xwe li hev xistinn, peyayên wî hatin. Ferman da: "Ji riya dur hesp ajotine û hatine."

Pigtî ku Ehmed û Gulbahar ji hundir derketin, rûyê Begê Xogabê ê xort, xemgîn bû. Mij daket ser çavên wî. Pore wî yê zer tarî bû. Xwe ramedand. Rabû ser piyan. Bejna wî pir dirêj bû, got:

"Xelîfe!" "Fermana şêx li ser serê min, le em dé çawa ji bin vî barî rabin? Yekî din bûna, ez de li hespê xwe siwar bûma û biçûma, min de bigota ji bo xatirê min keça xwe Gulbaharê bide lawê min Ehmed. Mehmût Xan ji vî zimanî fêm nake. Ew, tavilê, mirovan davêje zîndanê. Ew mêrxasekî ku li ber xwe dikeve û ji gotina xwe danayê. Ez wî ji

Istanbulê dinasim. Bavé min jî bavé wî nas dikir. Ev ci îş e. Ehmed ev keçik çawa ji sarayê revand, ji min re bibêje, em li gora wê çareyekê bibînin.

Îbrahîm pêgî ji hespê destpêkir. Rastiya çîrokê got. Di pey re hemî tigtên ku bûne yeko yeko gotin:

Beg got: "Dijwar e, xelifeyê min dijwar e. Mehmût Xan dîn bûye. De bixwaze tola vî ji hemî çiyayiyên Agirî, derya Wanê û dawiyê jî ji min bigire. Ji zû ve ye xeber gihagtîye pagayê Wanê, le em ci bikin".

92

Wê rojê heya sibê ramiya, serê sibê bangî îbrahim kir û gotê: "Binêre xelîfeyê min, ez nuha ci ramiyam. Pigtî panzdeh, bist rojên din ez ê Mêle Mihemedê zimanxweg bigînim cem Mehmût Xan. Ji bo lihevhatinê, Mehmût Xan ci bixwaze ez dé bikim. Ji şêxê min re bibêje, heger Mehmût Xan ji bo qelenê keça xwe keleha Xogabê jî bixwaze ez ê bidimê. Ji şêxê min re bibêje heger Osmanî, ordiya xwe bigine ser min jî heya ku cane xwe nedimê, keçê nadim tu kesî. Silavên min ji şêxê min re bibêje. Ji bo ku wî baweriya xwe bi min anî û emanetê xwe yê pir hêja ji min re gand, ez xwe di bin minneta wî de dibînim. Ez de stên wî maç dikim".

Wê gevê li kelehê, oda ku ji bo mêvanîn pir bi giranbuha dihate dayîn, ji bo Ehmed û Gulbaharê dan alî. Banê odê bilind bû, erd mermerkirî, kulavên sor raxistî bûn. Li dîwarên wî xaliyên Kurdan ê, bêhempa darve kiribûn. Rûyê orxanê ji atlas bû. Nivînên wan pir fireh bûn.

Gulbahar bi ûsul li hêviya Ehmed ma. Li dîwêr qendîleke

zîvîn pêdiket. Bêhneke xweg tevî danê wê kiribûn ji odê bêhneke xweg dihat.

Berî Ehmed bikeve nav nivînan, gûrê xwe ji kalan kigand

93

şûrê tazî danî ser nivê dogekê. Destika gûr hat ser balgehê.

Destika zêrîn di bin balgehê de sar ma. Û Ehmed li hêleka

balgihê dirêj bû. Gulbahar bi vê yekê gag ma. Di rê de, li

xana Ercîgê û li Wanê jî Ehmed waha kiribû. Mana vê, ez

û tu di nav nivînekê de ne, le em xwigk û bira ne. Ma di

navbera wan de xwigkî û biratî mabû? Li sarayê, li oda ser

zîndanê ji ber ku wan de carekê din hev nedîtana, ma Gul

baharê xwe nedabû Ehmed. Ma li wir nebûbû jina wî?

Nuha ev ci ye. Bi danîna gûr Ehmed dixwest ci bibêje?

Gulbahar jî hat, ket nav nivînan. Ehmed ne ew maç kir,

ne jî destê xwe da lagê wê... Ji xwe mana danîna gûr jî ev

bû. Vê gevê yekcar neaxifîn.

Agir ket dilê Gulbaharê. Dilê wê digewitî. Ci bû, ci

dibû? Ma ji Ehmed re tigtek kiribû? Ma toreyêk çiyayiyên

Agirî hebû ku wê nizanibû?

Heya sibê xew neket çavên wê. Cure cure hoy peyde ki

rin. Bag na xerab.

Gulbahar bûbû wek tîra kigandî û ji evîne dîn bûbû. Ji

xwe re difikirî û digot, rastiyek hebe ew jî guhartina ku di

Ehmed de çêbûye. Ehmed weke berê, dema hevudin nuh

dîtibûn helwest nedigirt. Hinekî sar, pir bi hêrs û pir xem

gîn bû. Ci bû? Ew guherîna Ehmed ji ber ci bû?

Destê sibê, Gulbaharê xwe nema girt. Ew giyar kir û pirsî:

"şiyar bibe. Ez ê tenê pirsekê ji te bikim. Bi rastî bêderew

a dilê xwe ji min re bibêje?

Ehmed ne peyivî. Serê çiyayên rohilat rohnî dibû.

Rohniya nîv tarî hûr hûr diket ser nivîna wan.

'Te ew gûr çima danî navbera me? Ez dixwazim hoya vê yekê bizanibim. Ma li sarayê ez nebûm jina te? Keskî dî tiye ku li pag wê gûr were danîn? Yan jî hin adet û toreyên çiyayîyan en ku ez nizanim hene? Heger tu jî min hez dikî tu de bersîva min bîdî.'

Ehmed bêdeng ma.

94

'Tu de vêna ji min re bibêjr'.

Ehmed bersîv nedida. Gulbaharê bê rawestîn bersîv dixwest.

Ehmed ji german diket bin erdê. Ramana ku ketibû

serê wî, çiqas dixwest je bavêje, le serfîraz nedibû. Raman

ku dilê wê digewitand û ew germezar dikir, Ehmed nekaribû

ji xwe re jî bigota, de çawa ji Gulbaharê re derew bike.

'Toreyek me nîne. Le toreyek vî kelehê, derûdora vê

golê û van degtan heye.... Ji ber wê min gûr xist navbera

me. Heya bavê te, te bide min, ez de destê xwe li lagê te

nexim.'

Gulbaharê bawer nekir le bêdeng ma. Hoy a ku Ehmed

destên xwe li wê nade, wê jî kêr zêde texmîn dikir. Le wî

jî nikaribû ji xwe re bibêje.

Û roj çûn. Kurmekî dilê Ehmed kûr kûr dikola. Gulba

harê ev yek herdem didît. Çavên Ehmed ketibûn kortikê,

û rohnayîya xwe wenda kiribûn.

Gulbahar roj bi roj di bin vî barê giran de dihelisî. Çardîwarên

tarî bûbûn cîhana wê. Digot mezintirîn neheqî li

min bûye. Li keleha mezin, di birê jinan de, bigîn bêxwarin û nîvmirî diçû û dihat. Di heftê de çend caran Ehmed û Begê Xogabê siwarê hespê dibûn û diçûn nêçîrê. Evaran, bi bizinên hov, teyrên mezin en nenas û pezkovîyan vedigeriyan. Di wan rojan de Gulbaharê rehet dikir. Qet nebe Ehmedê ku li ber çavên wê can dida, nedidît. Êdî Ehmed li rûyê wê jî nedinêrî. Li kelehê herkesî ev rewga Ehmed didît. Ji çend rojan carekê, Beg Ehmed digirt, digot:

"Ehmed lawê min li ber mekeve." "Hemî ordiya Osmanî were ser mi jî hûn de bigihên miradê xwe. Kesê ku were mala min de bigihên miradê xwe. Kesê ku were mala min û gêx pigtgirîya wî bike, ma dibe ku bitirse? Ma dibe ku ew kes bêhêvî be?"

96

Ehmed tigtek nedigot, hew ji beg re dibigirî. Kesekî de nizanibûna derdê ku dilê wî digetîne ci ye? Gulbahar jî de texmîn bikirana le de nizanibûna.

Mêle Mihemedê ku beriya deh panzdeh rojan çûbû Beyazidê Serê sibehekê vegeriya. Beg û Ehmed xwe ji bo çûna nêçîrê amade dikirin.

Beg, bangî Mêle Mihemed kir, ew kigand dîwanê û pir sî?: "Ci bû Mihemed ? Te ci xeber anî? Bag e, xerab e? Mihemed got: "Xerab e". "Riha wî ya sipî ji rûyê wî, ber bi jêr de mîna aveke zelal dirêj dibû. "Pir xerab e. Page bi rûkî xerab ez girtim sarayê. Tigt nemabû gûrê xwe bigîne û min perçe perçe bike. Ji min re got; Min ev kirê dijminatî û bêgerefî ji herkesî hêvî dikir, le ji wî nedikir. Ji min re

got hère ji wî re bibêje. Ji min re... Divê keçikê û Ehmed bi hev re girêbide û zûka ji min re bigîne. Di gel leqekê legker ve... Pigtî çûyina te bi panzdeh rojan bera beg ji min re bigîne. Heger keçik û Ehmed neyên ez de legker bigînim ser wî û ci hat devê wîji te û şêx re got".

"Ji şêx re jî got? ji şêx re jî?"

Jişêxrejî."

"Ev meriv har bûye, mejiyê wî leqiyayi ye"

Beg ket nav ramanan û derket derve. Ehmed li devê derî, dipa. Beg bê ku tigtekê ji wî re bibêje, ji kelehê berjêr bûn û daketin ser pire. Ehmed bi meraq li hêviya peyva wî bû. Dawiyê beg li ser pire rawestîya û got:

"Ev mêrik har bûye. Ji Sêx re jî xeberên nebag kirine.

Bêla de were serê wî. Xwedê giravî di nav panzdeh rojan de de ordiyê bigîne ser me".

Ehmed got: "Em herin Beg. Bera di rûyê me de xwîn ne rijê.Heyfe."

Beg 'Tu naçî tu deran." û qîriya "ji roja ku ava bûye, ke sekî bi zorê deriyê keleha Xogabê venekiriye.Heger hatine Mehmût Xan hebe,tigtên ku de werin serê wî jî hene. Tu

97

lawê vê malê yî. Nikarî herî derekê. Ev gerefî min e. Êdî ez heme, tu nînî. Rûne li kelehê û li kêfa xwe biné re."

Pigtre dîsa jî Beg û Ehmed diçûn nêçîrê û dihatin. Derdiketin, nêçîrê, çavnêriya legkerên Mehmût Xan dikirin.

Xwe ji ger re amade dikirin. Ê ji Agirî, degta Mûgê, Gola Êrmîyê, Wanê, Bêtlisê, Diyarbekirê pêgneyara alîkarîkirinê

ji keleha Xogabê re dihat. Ji her aliyê dostan destên alîkariyê dirêj dikirin. Vê yekê dilê Beg pir xweg fikir. Ew de dîsa li cola kelehê, bi Osmaniyan re bihatana rûyê hev. Ev tigt hemû ji bo toreyên begîtî en kevin bû û ji bo deynê ku girtibû ser milên xwe, bû.

Bi derketina rojê, ji dur ve qeflek suwarî xûya bûn. Bi çargav dihatin. Hespên wan çîm boz bûn. Li ser pira jêra kelehê siwariyan serê hespên xwe kigandin. Peyayên begê Xogabê, bi edeb pêrginiya wan kirin û serê hespên wan girtin.

Begê Xogabê li ber deriyê kelehê ê hundurîn pêrginiya mêvanê xwe kir. Hemî ji nêzîk ve nas dikirin. Serekêlên wê derûdorê bûn. Dizanibû çima hatine jî. Xûya bû, çavê Mehmût Xan, ji ger nebiribû.

Begê Zîlan, xortekî çeleng, jîr û xwingerm bû. Pêgî ew peyivî. Pozê wî wek nikulê qertelan xwar bû. Dengê wî ji kûr ve dihat:

"Beg bera ji bo vê yekê ger dernekeve. Em hatin çareye kê bibînin. Mehmût Xan legker kom fikir, me rê li ber girt Gotina dawî a te ye."

Begê Xogabê peyivî: "Hûn her tigtî ji min çêtir dizanin. Ez nikarim Ehmed û Gulbaharê ji page re bigînim. Ev bê çare ye. Dervî vê yekê page ci dixwaze li ser serê min. He ger vî xortî û keçikê ji wî re bigînim, heya qiyametê kûçik jî li rûyê min û rûyê malbata min nanêrin. Hûn ewçend beg, ji me re riyekê peyde bikin. Stûyê min li ber we xwar e.

98

Hirmeta min ji page re bibêjin, heger bixwaze hemî malên



min û cane min, li riya wî ne. Ci bixwaze ez de bidim kirin, gundan di riya zavayê wî de bidim. Ew bi xwe jî ci bixwaze li ser serê min... Le mêvanê ku xwe avêtibe mala min, ji bo canekî, ji wî re venagerînim".

Begê Zîlan got: "Beg rast dibêje. Em vala vala hatin". En din jî gotin: "Em vala vala hatin. Me bêxîrê kir. Heger piçek mêranî bi me re hebûna, bi daxwazeke welê biçûker em nedihatî pêgberî Beg. Ji me re germ e."

Roja duduyan li hespên xwe siwar bûn û ajotin.

Mehmût Xan, bi hêvî bû ku Beg de Ehmed û Gulbahar ji keleha Xogabê bînin. Ji bo wan herduyan di mejiyê wî de babet babet awayê lêdanê û kugtinê derbas dikir. Û yekcar nedihat bîra wî ku Begê Xogabê de keç û Xort nede wî. Ji ber ku forseke pir mezin û wî kiribû. Gotibû ez de legkerê Osmanî bigînim ser te. Begê Xogabê jî ne mîna berê bihêz bû. Ci dibû bera bibûna, wî de keç û xort bigandana. Begên mezin û esîlzade jî qey vala vala ne diçûn...

Vegera began, a dest vala ew dîn û har kir. Yekcar ew hêvî nedikir. Tigtin dibûn. Êdî kesekî guhê xwe nedida Osmanîyan. Bi begê Xogabê jî nema dikaribû derketa serî.

Divîya hertigt weke wê ji Ristem pagayê Erzurumê re biganda û diviya Ristem paga pigtgiriya wî bikira ku keleha Xogabê hilwegîne, bi erdê re bike yek. Diltengîya xwe nîganî began nekir.

Begê Zilan got: "Begê Xogabê biheq e. Ji bo canekî me riv nikare evîndarên ku xwe avêtine bextê merivan vegeirîne.

Divê em çareyekê peyde bikin."

Mehmût Xan nepeyvî.

Wê rojê ji began re xwrineke bag danî. Dîwan pir qele balix bû.

Serê sibê page, ji pagayê Erziromê re nemeyeke dur û di rêj gand û hemî tigt nivîsî. Pagayê Erziromê li nik padigah 99

merivekî pir giranbûha bû. Bi salan li sarayê, di nav wezîrên mezin de mabû. Heger pagayê Erziromê pigtgiriya wî bike, hertigt hêsan dibe û bi hêsanî dé serê Begê Xogabê ê pozbilind jêbikira. Name pir bidilgewatî nivîsîbû. Di gevekê de, bi sed hezaran mirov, fena gûrên hov daketin ser sa rayê û keça min revandine. Li pêgberî qelebalixê, ew û legkerên xwe, dest û pê girêdayî mane. Bi wê qelebalixa ku fena mojleyan bû, tigtek nekirine.

Pigtî demekê qasidê wî ji Erziromê hat. Ristem paga nameya wî xwendibû, xwendibû û keniyabû. Bi qasid, doza qelebalixa mezin a ku bi gev daketibûn, dabû gotin û kenîyabû. Bi caran bî wî dabû gotin û zikê xwe girtibû û ke niyabû.

Dawiyê jî ji qasid re gitibû:

"Pir silavên min ji Mehmût Xan re bibêje, bera keça xwe bide wî xortî, wî lawikî çawa hesp heq kiriye, waha keçik jî heq kiriye. Ji xwe ez ê jî ji wî re binivîsînim..."

Mehmût Xan nameya Ristem paga ku bi destnivîsek xwegik hatibû nivisandin, dixwend û ji wî re digot: "Bêgeref." "Bêgeref, lawê bêgerefan, tinazê xwe bi min dike. De bera were serê wî, bera kûçikekî çiyayî keça wî birevîne, de bikaribe bikene? De bikaribe tinaza xwe bike? De bikaribe, bi poz bilindî bibêje ma ji bo keçekê tu de bi cîha

nê re ger bikî? Min jî ev seg dost dizanibû. Li mala xwe, rûmeta ku dida padigahêkê, min da wî. Nuha jî bi vî nameyê tola xwe ji min digîre."

Name li hev dixist, diqulipand, carekê din, carekê din dixwend.

Wî de legker bigandana ser Xogabê, begê Xogabê gurê hov zora wî bibira... Heya îro ne hatiye dîtin ku kesekî zora keleha Xogabê biriye.

Her û her Mehmût Xan acîz dibû. Her ku aciz dibû, çewtiyên wî pir dibûn. Her roj bi îsmâil Axa re dipevî,  
100

bangî begên ku bi wan bawer bû, fikir, bi wan digêwirî. Le çareyek peyda nedikir.

Di wê navberê de qasidê Begê Xogabê, Mêle Mihemedê zimanxweg dihat û diçû sarayê û digot:

"Pagayê min" "Cane me gorîye te, Begê me dibêje, ji bo vî keçê bera min di nav xelkê de riswa neke. Ez tîm destên wî. Heger pageyê min, mêvanên min ji min bistîne, li vir seg jî nema li rûyê min dinêrin. Li rûyê malbata min jî nanêrin. Qelenê keçê ci bixwaze ez de bidimê. Heger page cane min jî bixwaze ez de li riya page, li riya Mehmût Xan bikim gorî. Dema ew ji Ehmed re jî bibêje, bimire, ew de bimire".

Roj bi roj Begê Xogabê li rewga Mehmût Xan dinêrî, wî dizanibû ku page, ji pagayê Erziromê û Wanê, ji begên biçûk û mezin û ji padigahê îstenbolê jî alîkarî xwestibû.

Dawî dawî ev mêrikê bêheg û serhigk dé rojekê legker bigandanan keleha Xogabê. Dibe gerekî ku bi salan bajota,

destpêkirana. Hejar û belengaz de dîsa di navê de biçûna.  
Ev hemî de ji bo keçikeke revandî bibûna. Kê ev tore derxistibû,  
kîjan beg û gelê bêmejî ev peyde kiribûn?.

Page jî ji vê ditirsiya. Diviya ev tigt girêbidana. Çûna hes  
pê a ber deriyê Ehmed, bi vî çûyînê re distpêkirina evîna  
wan a mezin, ji rûyê vê evînê û ji rûmeta vê evînê xwe feda  
kirina Mémo, êdî ev doz dikir, dozeke miqqedes. Ev tigt  
hemî bûbûn hoyên ku Ehmed û Gulbahar fena ziyaretê  
bêtin dîtin. Dîsa dikaribû çiyayî û degtî gevekê rabin ser  
piyan. îcar jî ku rabin di sarayê de kevirkî li ser keviyekê  
nehêlin û li sarayê kesekî sax nehêlin.

Mehmût Xan heroj ev yek dianî bîra xwe. Êdî xewa ge  
vên wenda kiribû. Guhê wî le ser dengê derve bû. Bi den  
gekî biçûk jî çeng dibû. şûrê wî yê tazî di dest de li sarayê  
fena nûgiyaran digeriya.

Ketibû neqebeke teng. Diviya ji vê yekê re çareyek bidî-  
101

ta. şerefa wî û a dewleta Ai-Osman daketibû pêne peran.  
Begekî wek yê Xogabê, biçûk, zora wî biribû û zora Osma  
niyan biribû.

Roj bi roj diheliya, nedima. Nizanibû de ci bike? Êdî bi  
kesekî re ne dipeyvî. Ji dilê xwe pê dihesiya; her roja ku  
derbas dibe hîn pirtir dora wî bi xelesa naletê dihate pêçan.  
Hersai bi hatina baharê re, li Agirî hemî givanên wê he  
rêmê, li dora gola Kûpê a ku li navsera çiyê bû, kom dibin,  
kulavên xwe davêjin ser axa qehwerengî û ser zinarên sor  
en ku ji kevirên heste çêbûne, wek xelekê rêz dibin û rûdinin.  
Hersai hejmara givanan têt guhertin. Bi rohniya sibê

re bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, bi hev re li çîroka xezeba çiyayê Agirî dixin. Gava roj diçe ber ava, hêdî hêdî bi hev re bilûrên xwe davêjin milên xwe û radibin. Wê gavê çûkeke biçûk û sipî jî tê, baskekî xwe li ava, golê agîn û birqonek dixê, difire û diçe. Ji dur ve, li jor, ji nav berfê, ji bin zinêr hespekî pir girs weke kegtiyekî xûya dibe. Di tariya êvarê de taximên wî dibiriqîn. Pigtre sîha hespê dibe xeyalek û dikeve ser golê, digemite, hin bi hin li degtê diçilmise, piç piç dihele û wenda dibe.

Di pey çûna givanan, dengbêjek din nav konkî de li ser axa biharê a bi nekme, li ser çogan rûdinê, darê xwe dikigîne û dest bi strana xwe dike. Bilûrvanek jî bi wî re li bilûrê dixê.

Ez li ser axa Ahûrê a naletî li ser çogan rûnigtim, li ser axa evîna hezar salan û axa bihara hezar salî li ser çogan rûnigtim. Min se caran bang kir, se caran çiyayê mezin bersîva dengê min da. Li bin bêndera sitêrêkan, li ser kulîlkên sor, gîn û zerê tarî, li ser keska birqonekî, li ser çogan rûnigtim. Li pigta çiyê, li ser dilê berfê, li ser çogan rûnigtim... Li ber rohnayiya çiyayê ku ji evînên mezin re dilê xwe vekirîye, li ser çogan rûnigtim. Min sitrana xezeba mezin got.

102

Li bin ewrên reg û tarî, di nav bêhna ku mirovan serxweg dike de li ser çogan rûnigtim. Li ser pela pêtiyeke mezin ya ku ji çiyê derdiket rûnigtim. Min se caran bangî çiyê kir. Se caran bangî dilê axa bihara hezar salî kir. Se caran jî min bangî guhê axa evînê hezar salî kir. Mi got, givano, givano, tu li ku yî? şivan hat li ber min rawestiya.

Û givan evîndarê keça Beg bû. Keçik jî evindara givên bû. Beg ev yek bihîst. Panzdeh gundên beg hebûn. Panzdeh gundên wî jî li gelîyê Ahûrî bûn. Beg got ku vî givanî bigirin, ev givanê ku dikare evîndarê keça min be, bigirin ez wî sax yan mirî dixwazim.

Çûka evînê bû bizotek û çû li ser dara sipîndarê a bizotî hêlîneke bizotî çêkir. Çûka evînê di wê hêlînê de bicîh bû. Se çêlikên wê çêbûn. Çûka evînî bi se çêlikên xwe en bi zotî firiya. Cihê ku firiya û cihê ku le venigt kirin bizot. Çiya bû bizot, kevir û ax bûn bizot. Ezman û strêk di nav bizotan de çelqiyên. Meriv hemî bûn bizot. Çûka evînê a bizotî, çû wî aliyê derya û çiyên. Wî aliyê derya bû bizot, pey çiyayan... Kulîlkan bizot vedan. şîne tarî bizot vekirin, zeran, keskan bizot vedan.

şivan çû, xwe dispart çiyayê Agirî., Dilê çiyayê Agirî bû bizot. Mêrên panzdeh gundan, ji bo girtin û kugtinê ketin pey givên, qui bi qui li Agirî geriyan çiyê givan vegart û parast givan bû bizot.

Nema debara keçikê hat, wê jî rojekê xwe avêt çiyayê Agirî. Zar, zêç, pîr, xort, jin, mêr, hemî merivên panzdeh gundan îcar ketin pey keçikê. Agirî keçik jî vegart. Keçik bû bizot.

şivên nema xwe girt. Rojekê ji Agirî destûr xwest û ji cîhê xwe derket got." Bera ez carekê din delaliya xwe bibî nim. Heger ez bêm kugtin jî bera bikujin" Hat dora gund. Se roj û se gevan li dora gund çû û hat. Dixwest mirina xwe bi derengî bixe. Mirin dijwar e. Pigtre bi carekê çavên xwe girt û daket nav gund. Nêrî ku cîhê gund vîkî vala ye. Çû

gundê din, çû ê din, dît ku hemî gund meydanên vala ne.  
Nêrî ku li nêzîkî wî, U nik zinara ku nêzîkî mala wan bû,  
delaliya wî dog dibe. Herdû delalî gîhagtin hev.

Dilê çiyayê Agirî ji zilm û xerabiyê tije bûye, parçekî xwe  
bi ser wan de gandiye. Her panzdeh gund, hemî bi hev re,  
bi meriv û bi tigtên xwe ve di bin wî parçeyî de mane. Çiya  
ew daqurtandin... Ev xezaba Agirî ye. Çûka evîne bizotek  
e. Digihê kîjan dilî, dike bizot. Hêlîna evîne bizot e.

Xezeba Agirîyê ye ev. Ev bêla Agirîyê ye. Mirov nikare  
li pêgberî Agirî raweste. Ev laneta Agirîyê ye.

Û her bihar gava kulîlkê dora Gola Kûpê vedibin, hemî  
givanên çiyayê Agirî tî rexên golê. Kulavên xwe li ser axa  
bihara hezar salî radixînin... Û çûka evîne bizotî... Baskê  
xwe li gola gînî tarî dixê.

Hisoyê Hesinker bi lagê xwe yê nîv tazî, li ber deriyê sa  
rayê heya je dihat diqîriya, digot:

"Page, page, te dengê bilûra bilûrvanê baharê bihîst? Tu  
têgihîgtî page? Xezaba Agirî bi ser te de bê... Bêla Agirî bi  
ser te de bê. Destên xwe ji sînga wan evîndaran bikgîne."

Mehmût Xan ji peyayên xwe re got:

"Herin wî hesinkerê bînin vir ez binêrim ew ci dibêje? Ez  
têbigihêjim."

Hiso heya navî, tazî bû. Lagê wî yê xurt ne wekî ê mirovan  
bû. Gava Mehmût Xan ew bi wî awayî dît, tirs ket dilê  
A WI.

Hesinker pirsî: 'Te li dengbêjê ku min ji te re gand,  
guhdarî kir".

Xan got: "Min guhdarî kir."

"Bag e tu ci dibêjî? Ma qet natirsî" Page nepeyvî. Ci hat devê Hiso, got û mîna zinarekî rabû, megiya. Gava ji derêyî dîwanê derdiket got:

'Tu dizanî paga. Tu dizanî.'

105

^O/^O^

Li pey derketina wî îsmâil axa got: "Pagayé min dixwa zim çend tigtan ji te bipirsim."

Page got: "Bipirse".

"Ma tu caran kes derketiye serê vî çiyayê Agirî."

Page got: "Na"

"Ma mirov dikare derkeve wê?"

Page got: "Dibe ku karibe derkeve. Lé nikare vegere.

Agirî de wî bigire pagde bernade.

Pir kesan derketina serê Agirî dabûn ber wxê. Le tu kesê ku çûbû serê çiyayê venegeriyabû."

Tam di navsera jora çiyê de bênderek ar heye. Ji wê navserê kunek dadikeve nivê cîhanê. Pêgî pêgî jar ji wê kunê hatiye girtin. Are ku mirovan cara pêgî dîtibûn are dilê çiyayê Agirî bû. Mirovan xwestine wî arî bigirin. Girtine jî... Kesê ku çûbû êr birevîne ji xaqilbûna çiyê destkewtî bûye... Ji bêndera êr, hinek ar jêkiriye û ji çiyê ber bi jêr de reviyaye. Ta daketiye jêr. Tam wê gavê Agirî li xwe hay bûye, nêriye ê ku ar revandiye dur ketiye. Tabilê li wir ew mêrik rawestandîye û agirê destê wî tavilê kiriye kevir. Navsera çiyayê Agirî bi merivên ku bûne kevir tijeye. Ê ku derkeve jora navsera çiyê, wê derê bibîne, êr bidize, yan nedize, tu caran efû nebûye û xellas nebûye.



Îsmaîl axa: "Mafir welê ye, pêgnyareke min heye".

"Bêje îsmaîl"

"Em niha ji Xogabê re xeberê bigînin... Bera Gulbahar û Ehmed bèn vir. Tu bixwazi ez de herim, wan bînim vir. Heger Ehmed karibe derkeve serê çiyayê Agirî û derketi na xwe ji me re bipesirîne em de bi destên xwe keçê bidinê. Daweta wan jî em de çêkin. Bi wî awayî em de jî Ehmed xellas bibin. Ji zimanê zekê û zilma wan xellas bibin. Gotinek kesî jî namîne."

Page got: "Namîne. Rameneke bag e. îsmaîl. Du se be gan bigire nik xwe, hêre Xogabê. Bera Ehmed bê, bera 107

Gulbahar jî were. Heger Ehmed qiyma xwe bi pêgnyara min neyine, ji begê Xogabê re bibêje, bera keça min bigîne. Îsmaîl axa, bi pêne kesan re, wê rojê suwar bûn û ketin riya Xogabê. Ji wan dudo, beg bûn.

Gihagtin keleha Xogabê. Beg ji hergavî pirtir bi dostayî pêrginiya wan kir. Pir xwarin ji wan re danî. Wê gevê îsmaîl axa mesele ji Beg re vikir. Beg got:

"Çawa dibe îsmaîl axa? Ev mirin e. Page Ehmed digîne riya mirinê. Ma heya îro kesek heye ku çûye serê çiya û ve geriya ye? Kesekî dîtiye, bihîstiye?"

Îsmaîl axa got: "Ez nizanim. We digot, hûn ci bixwazin em de bikin. Va em dixwazin.

Beg bêhêvî got "Em ji Ehmed jî bipirsin, ka bê ew de ci bibêje"

Heger Ehmed qiyma xwe bi vî daxwaza wan neaniyana, êdî begê Xogabê ne mecbûr bû û wan di kelehê de bihêle

û wan biparêze. Ehmed jî, herkesî jî ev yek dizanibû. A duyem jî gava paga ger derxe, rewa bû.

Beg bangî Ehmed kir. Li nik îsmaîl Axa û en din je pir

sî: Ehmed bê rawestin û bi rûkî xweg got:

"Bag e" ez de hilkgim serê Agirî. Bi gev li wir agirekî me zin dadim. Page de jî bibine. Em xwe amade bikin."

Begê Xogabê, Gulbahar û en mayî, kirin ne kirin, nikaribûn

Ehmed ji vê riya man û nemanî bi gûnde bihêlin. Wî devjêberneda.

Roja duduyan, ji hev xatir xwestin. Suwar bûn berê xwe dan Beyazidî...

Ehmed û Gulbahar çûn mala gêxê karwanan. Hemî xelkên

Beyazidê û dora çiyayê agiriyê, hatina wan bihîstin.

Hesinker hat mala gêx. Ew û gêx bi hev re li ber Ehmed geriyan. Gotin:

"Ev paga kafir e. Dixwaze te bikuje."

108

Ehmed dev ji a xwe berneda. Çiyayî jî hatin li ber

Ehmed geriyan. Ehmed li kesî guhdarî nekir.

Sibehekê, çû destê gêx, maç kir, li hespê xwe siwar bû û çû sarayê, derket pêg page got:

"Ez derdikevim serê Agirî, pagayê min. Mala te ava be, ku te ez xistim karekî welê dijwar. Heqê te H min heye".

Page ji wî re serketin daxwaz kir:

"Hûn de se gevan li ser Agirî binêrin. Di demeke sayî de navsera ciyê de biçûrûsîne û bigewite.

Dîsa li hespê xwe siwar bû. Hespê, ew ber bi nawera çiyayê Agirî ve bir.

Qelebalixê, hêdî hêdî meydana Beyazidê, pazara wê û pêgiya sarayê dadigirt. Çiyayî bédeng, bédeng ji çiyê weke lehiyekê diherikin û dadiketin, li qezeya Beyazidê dicivîyan. Li jora degtê, ji qiraxa çiyê, meriv dadiketin û dihatin Beyazidê, kom dibûn. Çargî, kûçe, kolan û mizgeftên qezê dadigirtin. Bédeng radiwestîyan.

Berî nîvro îsmâil axa hat nik page. Page je pirsî:

"Ma hîn jî tîn. Dawiya wan nehat?"

"Belê hîn tîn" got û destên xwe bêhêvî vekirin "pirtir di bin, pirtir tîn. Wek lehiyek merivan diherike, diherike û dawiya wê nayê. Çuqas mirov li vî çiyê û li vê degta me hebûye".

Page got: "Pir mirov hene, li vê cîhanê pir mirov hene. Le ji bo tigtekî bag ew çend kom nabim. Ewqas zû ji ku bihistin ku ew de hilke çiyê? Ji ku bihistin ku tîn? Gelo kê hayê wan gîhandê? Ma hîn de werin?"

Page li salona sarayê a bi mermer û pir sitûnî, diçû û di hat. Linge wî di nav pirça Xalîçê de wenda dibû, rûyê wî dirêj û zer bûbû. Qermiçîna dora çavên wî yen ku wek agir diçirisîn, kûr bûbû.

Piçek bi germ pirsî: îsmâil axa ka a din, a me li ku ye?

îsmâil axa qelebalix nîganî wî kir û got:

"Li wir e. Li pêgiya qelebalixê ye. Nêzîkî gora Ehmedê

109

Xanê, di nav jinan de ye. Binêre pagayê min, li wir e. Zer li xwe kiriye."

Page destê xwe hejand, pagde vegeriya. De tigtek bigota, rewayîxwe nedît. Dev je berda û bê ku li îsmâil axa binêre dîsa megiya. îsmâil axa radiwestiya, li hêviya peyva page

dima. Li pey demeke dirêj, page ji nigka ve rawestiya, serê xwe hilda, bi çavên xwe en mîna bizotê li îsmâil axa nêrî û pirsî: "Em nikarin tu tigtî bi vî qelebelixê bikin, em nikarin wan belav bikin. Ma ne waha îsmâil axa?"

îsmâil axa: "Em nikarin tigtekî bikin; legkerên me û qigle ji zû ve di nav qelebelixê de wenda bûn. De nikaribin tilîyên xwe jî bileqîn. Li sarayê ancax sed û pêncî, dused legker hene. Bi vê qelebalixê ordî de nekevin serî."

Page keserek kigand û got:

"Nikarin derkevin serî" "Hayde tu hêre, li qelebalixê bi nêre, bê hîn tîn?"

Wê rojê heya êvarê qelebalix mezin bû. Kom bû. Qeza têra wan nekir, geliyê qezê, degt bagûrê gelî jî tije bûn. Hêdî hêdî bi qiraxa çiyê a jora goristana Ehmedê Xanê ve hilkişiyên. Hîn pagiya qelebalixê nehatibû. Ji çiyê û ji degtê her bêrawestî xelk dihatin. Pigtir ber êvarê kon vebûn, li ber konan agir hâte pêxistin, bêhna dohn û bêhna giyayê bigk, tevli bêhna kulîlkên higk bûn. Le ev qelebalix pir mezin, mîna bêcan bû. Bêcan û bêlebat bû. Bê dengî, fena rohnîyek bû sîh diçû vî alî û wî aliyê din.

Gava tarî ket erdê, Mehmût xan ji îsmâil axa pirsî:

"Ma hîn tîn?"

"Erd û ezman bûne meriv, ji stêrkên ezmên, pirtir in.

Qelebalixek ku erd wê ranagire..."

"Qet napeyivin?"

"Deng û hîs dernaxînin."

"Ma li cîhekî, li Agirî jî nanêrin?"

"Na, nanêrin, wekê di nav xwe de girtî mane. Tu dibêjî

### III

qey ew qelebalixa mezin radizê. Weke ku axa miriyan ketiye ser wan. Usa bêcan in. Di rûyê kesekî de liveke biçûk jî nayê dîtin..."

şev reg bû. Ezman sayî bû. Li jora qiraxa Agirî stêrk wek ku bi mîxna hatibin sekinandî, kom bûbûn û yek li a din diket. Qor qor rêz bûbûn. Bêdengiyek, wek bêdengiya gîne ketibû ser qezê. Mirovan bêhna xwe jî nedikigandin. Wê gevê heya sibê xew neket çavên Mehmût Xan... Li sarayê çû û hat. Ê ramiya. Di mirin û jiyînê de fikirî. Mirovan, ew mirovên ku li derve bûn, û qelebalixa ku ji van çuyan û degtan hatibûn, difikirî. Ew ji bo bextiyariya jin û mêrikekî, li vir kom bûbûn. Ji derve de waha xûya dikir. Le di bin wê de pir tigt hebûn. Di bin de, diltengî û aciziyeye mezin hebû. Hîssên serhildana sed hezar salan hebû. Ew hêrsa mezin ku nedipeyivî û ne dileqiya... Hêrsa ku evîna keçik û xortekî kiribû mahne... Hin bi hin dem xerab dibê û gel serî hildide. Îro bi mahna keçikê, de ser sarayê min de bigirin, dibê de jî li Istanbulê, bi mahna tigtekî dîtir bi ser saraya padigah bigirin. Ji min re wekê dixûya ku dem hatiye. Heger em carekê ji vî gelî re ne bînin, serê me hemiyan de hêre. Sibe de zilmê bikin mahne, du sibe de begê bikin, se sibe saraya me, pigtî wê de nênin bikin mahne... Ê de kom bibin, kom bibin... Bi êga sed hezar salan... Fena a nuha bêdeng kom bibin. Ê hêzek bi vê qelebalixê nikare. Ordî bi van nikarin. Bi qasî cîhanê ordî hebin bi wan re dernakevin serî. Bera ew nebin yek, ku bûn yek, nema rê li ber wan têt girtin. Çareyek divê. Çareyek ku nikaribin bi

bin yek...

Rojekê pir rohnî, zelal, li asmanekî vekirî pêket. Û li çiya.piçek derbas bû, rojê xwe bi qiraxa jora Agirî ve girt û pigtre je dur ket. Bîstekê din dîsa xwe bi Agirî ve girt. Da wiyê ji çiyê bag bi dûrket û rastî çiyê rawestiya. Mehmût xan tu caran ev rewga rojê nedîtibû. Ji xwe re got, rojê jî  
113

rewga xwe guhert. Elamet xûya bûn, elametê roja qiyametê... Pigtî ku çêlkên xwe berdidin, mêgên hungiv, kerî kerî li ezmanan digerin. Pigtre jî katekî darê peyde dikan û li ser wî hev digirin. Di navbera xwe de qet cîhê vala nahêlin. Vê sibê li qeza Beyazidê jî usa bûbû.

Bi avêtina tîrêjên rojê, mêrên bejin dirêj, simbêl dirêj, kumên xwe en kulavîn, postên xwe en bizinan, canî û pezkoviyên en rengoreng li xwe kiribûn, jinên zend zirav çavreg, çavgirs çavê kofiyên xwe yen rengoreng bi zêr û zîv xemilandibû, çend fîstan li ser hev li xwe kiribûn û ketibûn nav hev. Dîsa deng ji wan nedihat.

Dema tagtê, di nav qelebalixê de guherînek çêbû. Hemû kesan berê xwe dabûn nav hev, Agiriyê dinêrin û hemî usa man.

Mehmût Xan ev tigt dît. Gava ev dît jî pir tirsîya  
"Yek car napeyivin ne waha Ismaîl Axa?"

"Qet napeyivin pagayê min. Vaha rawestiyane, bê ku ça vên xwe bigirin li çiyê dinêrin. Carekê jî destên xwe ber bi ezmana vekirin û li ber xwedê geriyan.

Ew de waha se rojan bipên, gava li serê Agirî rohnahiya êgir nebînin, de berê xwe bibin sarayê, sarayê hilwegînin,

bi erdê re bikin yek, kevir li ser kevir de nehêlin.

Mehmût Xan got, qey ez bê hoy dikevim tirsê, bê sedem ditirsim"

"Ma hîn tên îsmaîl Axa?"

"Hin bi hin pir dibin... Ewçend mirov ji ku tên? Kî van tîne? Mehmût Xan bi qîrîn got: "Ew mirdarê pîs, ew kafir, gêxê karwanan. Ew gêx hergav dijminên me ne. Heger em wan nekigînin nik xwe em de birûxin. Em de birûxin îsmaîl Axa em de birûxin. Hêza wan pir e û di nav xelkê de rîç dane, îsmaîl Axa... Rehê wan di kûr de ye. Kokê wan ji sed hezar salan de ketine nava gel, îsmaîl Axa. Heger em  
114

bi wan re nebin yek... Ji pencerê xelk ganî wî dan "Ha de waha be, îsmaîl Axa..."

îsmaîl Axa got: "Pagayê min, kîjan gava em bixwazin em de bi wan re bibin yek."

Di serê Mehmût Xan re derbas bû û got, vê gevê ez zar, zêç û peyayên xwe kom bikim û sarayê vikî vale bîhêlim û herim. Ma ew de nebe tirsokî. Ma haya îstanbulê de ji vê yekê çênebe, ramiya, pigtre jî... Pigtre çarmedora serayê jî pêçane, ma em de çawa birevin? Ma em de ger bikin û bi revin...?

Bi carkê qîrîya:

"Hele ez ji vir û ji vê rewgê xwe xellas bikim, ez de serê wî gêxê karwanan û ê wî begê keleha Xogabê bidim jêkirin. Ez de serê wan bidim jêkirin. Heger ne ew bûna ew çend qelabalix li dora saraya min nedihatî cem hev. Ez de bidim jêkirin, bidim jêkirin! îsmaîl Axa ez de bidim jêkirin

Bera ew bibînin, bibînin."

Heya je dihat, diqîriya. Damarên gewriyê wî sitûr bûbûn. Ji ser heg çûbû. Got, got, pigtre hêdî hêdî bêhna wî derket. Nerm û hêdî bû. "Ez de bidim jêkirin, bidim jêkirin, ez de stûyê wan bidim jêkirin. Ez de ji vê belayê rizgar bibim." Îsmaîl Axa, li wir, li ber derî, pigta xwe siparti bû sitûneke mermer a sorgez û li hêviya derbasbûna bêhtengiya Mehmûd Xan bû.

"Ma, dengbêj û bilûrvan jî hatin îsmaîl Axa?"

"Bi sedan... Bi sedan jî defvan hene. Li hêvîya dawetê ne"

"Îsmaîl axa, xwedê bike li serê çiyê agir pêkeve. Anna..."

Mehmût Xan, ji bo ku dîtina xwe û tîrsa xwe ji nêzîktirîn destê xwe re got, germ kir. Di devê xwe de gotin bir û anî û xwest gotina xwe biguherîne, le bi serneket... serê xwe bera erdê da.

Îsmaîl Axa, têgihigt ku ew pogman bûye, axa serwextî hemî tigtî bû. Axa merivekî vekiribû got:

115

"Paga" û dom kir "Pagayê min ev qelebalixa ku dikele, heger îgev li serê çiyê agir nebîne de bêsebir bibe. De bèn vê sarayê serûbin bikin. De me hemîyan bikujin. Em çima vê yekê ji hev vedigêrin? Çima em nawêrin ji xwe re bibêjin? Ev tigtekî weke qedê ye. Divê em rîya wî bigirin".

Mehmût Xan fena ku can bide got: "Çawa?" "Çareyekê çito?"

'Tu de dev ji daxwaza xwe berdî paga. Dev ji daxwaza xwe berde, derkeve ser deriyê sarayê, bibêje, mafir ew çend qelebalix vê yekê dixwaze, ji bo xatirê ve qelebalixê



ez jî ji daxwaza xwe derbas dibim. Ji bo xatirê we min keça xwe da Ehmed, herin Ehmed bînin em dawetê li darxin... Tu de bibêjî, ji bo xatirê we, jî bo dilê we xweg be ez de da wetê jî çêkim. Pigtî wê, ev qelebalix de te li ser serê xwe bigerîne, ya paga. Di çavên wan de, tu de pigtî xwedê werî.

Weke din jî çare nîne pageyê min".

"Ez nikarim bikim îsmaîl axa, de bizanibin em tirsiyan."

'Tirsa me qet naye bîra wan. Qelebalix fêsadî û tevliheviyê nafikire. Niyeta wan bag e."

"De bê bîra wan îsmaîl. Kesek fena qelebalixê ne bi aqil e".

'Tu çewt î page. Xerabkirina sarayê li hîsabê wan nayê. Le ew mecbûrî xerabkirinê ne. Tevî ku dizanin de pigtre ci bê serê wan, dîsa jî mecbûr in xerab bikin. Mecbûr in me bikujin. Dibe ku nuha Ehmed miribe jî. Dibe ku Agirî ew daqurtandiye, jî... Dibe ku...

'Tu rast dibêjî, tu rast dibêjî. Le ez nikarim bikim îsmaîl, Axa, ez nikarim ji gotina xwe vegerim".

"Ew jî ditirsin. Gava tu dev ji biryara xwe berdî ew de dilga bibin ji ber wê jî tirsa me nayê bîra wan. Birovaja ew de te bikin miqqedes. De qenciya te derxînin ezmanan. De U ser te destanan derxînin."

"Ez nikarim bikim îsmaîl Axa, ji min nayê. Min bikujin

116

jî. Him, him, him... Dibe ku derkeve serê çiyê. Dibe îgev em êgir bibînin..."

îsmaîl Axa bi qîrîn. "Nabe" û qîrîya "Agirî nahêle kesek hilkige jorî wî. Wî digire û dike kevir..."

"Di vê de kerameta gêx heye, dibe ku kerametek..."

"Agirî li kerametan nûnêre. Jî kesekî re keysa, xerabkirina tilisima serê xwe nade."

"Dibe Ehmed neçe serî, li jêr agir pêxe."

Îsmâîl Axa destê xwe avê rîha xwe, kenîya. Destên xwe di hev dan, got:

"Ehmed mêrxas e. Dizanibû de bimire û çû. De bigihê serî."

"Îsmâîl Axa ez jî ji a xwe venagerim. Ez ê ger bikim, bi kim, bimirim. Rabe hêre nik legkeran, bera xwe amade bi kin. Legkerên qiglayê jî bigînin sarayê. Em de ger bikin û bimirin."

Îsmâîl Axa got: "De keysa ger nekeve destê me page. Ez qelebalixa waha nas dikim. Heya em çavên xwe vekin û bi girin ew de me hemîyan paqij bikin."

Paga bi qîrîn "Bera me nehêlin" qîriya "Em de di wê dema ku çav têt girtin û vedibin de ger bikin. Hêre ji wan re bibêje, bera xwe amade bikin en qigle jî bera bîn"

Êdî Îsmâîl Axa nema peyivî. Dizanibû peyva wî kêr nayê.

Ji pêkanîna fermana wî pê ve tu çare nema.

Êvar bû, tarî ket erdê. Degta jêr ji merivan reg dikir.

Hin bi hin mirovên nuh dihatin degtê û çadirên xwe vedikirin.

Li ber konan komik komik agir dest bi pêketinê kir.

Dema tarî daket, ew qelebalix jî rabû ser pîyan. Hemîyan serê xwe ber bi Agirî zivirandin. Ewçend kes, bûbûn yek dil û li çiyê dînêrîn. Ev se roj in ku li hêviya agirê ku wek vedana rojê li serê çiyayê Agirî de bihatana pêxistin,

rawestiyabûn. Hingî dinêrîn, çavên wan bûbûn çarçav.

117

Mehmût Xan jî li saraya xwe agir dipa. Li hêlekê  
Mehmût Xan, li hêlekê qelebalix, dilê wan li ber devê wan,  
li bendî kerameta Agirî bûn.

Kelegêrên nivê gevê bang dan. Li ezmanan, ji stêrkên ku  
bi Agirî ve zeliqîbûn, pê ve tigtekî din tunebû. Hêdî hêdî  
rohniya sibê, xûya dibû. Sitêrka bi terî hêdî hêdî stêrkên  
xwe yen gîn wegand. Ew sitêrk weke din xuya dikir, weke  
heyveke seyr xûya dikir.

Îsmâil Axa bi lez hat, di xûydanê de mabû, got:

"Nuha dest bi gurmînê kirin. Berê xwe jî hêdî hêdî ber  
bi sarayê ve dan. Ne hemî, hinek ji wan."

Çavên Mehmût Xan bûbûn wek gola xwînê. Destê wî ca  
rekê diçû ser gûrê wî, carekê diçû gegderba nava wî a ku i  
zêr û qondaxa wê ji diranê fîl çêbûye. Sernaserê gevê destê  
wî waha çûbû û hatibû. Çavên wî jî her li serê Agirî mabûn.

Îsmâil Axa Gotê:

"Wekî din rê nîne paga, wekî din riya rizgariyê..."

Paga êdî xwe berdabû. Hêdî hêdî, dihijiya û dixwest xwe  
her kom bike, hêza xwe kom bike. Bi wî awayî ber bi sa  
rayê megiya ji deriyê mizgeftê derbas bû, li hewgê çend ca  
ran lingên wî ber bi pagde diçûn. Xwest vegere, le nikaribû  
vegere. Hat ber deriyê hewgê ê mezin, ê ku bi neqigê  
Selçûkîyan neqigandibû. gava qelebalixê ew dît dengê xwe  
birî. Wek keviran bêdeng ma. Hilm jî negirtin. Mehmût  
Xan, demeke dirêj çavên xwe en girs li ser qelebalixê gerand.  
Qelebalix a nuha rengê deryayi ku carekê pêlên wî

rabûbe û dawiyê daketibe, dida.

Page hilkigiya ser mitika ber deriyê sarayê, got:

"Min Ehmed ji bo xatirê we efû kir" û domand. "Daweta wî jî ez ê çêbikim. Mafir hûn ewçend xelk, ewçend kes hatine, nuha ez ê yekî bigînim, Ehmed bidim anîn. Heger di nav we de yekî cansivik û siwarîkî bag hebe, bera xwe bigi  
118

hêne Ehmed, bêje page dev je berda."

Humînîkî ket nav qelebalixê. Pela deng, çend caran ji alîkî çû aliyê din. Milet bûbû wek tîra kigandî. Şidiyayî bûn hatibûn dereceya teqînê. Page serwextî vê yekê bû.

Page, jî bi awakî gelek bixwebawer û bêtirs daket. Le dilê wî ne usa bû. Dilê wî kute kut dikir. Bi gavên giran ket sarayê. Peyayê wî se gava li pag wî dimegiyan...

Gava Page ket hundur, gelek xortên siwarî û peya keti bûn riya Agirî. Qelebalixek weke bifire, herîkî ser çiyayî Agirî.

119

Wê rojê qelebalix sist bû. Dest bi peyivînê kirin. Fena kewara mêngên hungiv h nav hev diketin. Merivan destên xwe bera kêlekên xwe dan, bêkar, li ber tavê, wek pêgmûrdeyan bê ku bizanibe ci dikin û diçin ku, diçûn û dihatin, dizivirîn.

Hesinker bi kêf ketibû nava qelebalixê digot "Kafir hat îmanê." "Tirs ew anî rê. Ew têgihigt ku saraya wî ya zêrî, se raya wî ya zîv û mermerîn de bête rûxandin. Kafir têgihigt û hat îmanê."

Herkesî bi dilxwegî li Hisoyê Hesinker dinêrî:

"Heger em hergav, di her tigtî de waha bibin yek, kes nikare zora me bibe. Çiya û gah xwe li ber me nagirin. Ke sek... tenê em waha bibin yek."

Li pag wî hinan, en ku danustandina wan bi sarayê re hebûn, digotin "Agirperest" "Dijminê ol, ji te re ci ye? Em bi bin yek an nebin yek tu agirperest î".

Û Hesinker ev gotinên ku li pag wî dihatin kirin ne dibihîstin. Merivên ku li degtê bûn, carekê hildikigiyan qezê carekê dadiketin jêr xebera ku ji Agiriyê de bihata, dipan. Hîn ji nuha ve çend kes ji payinê diltengî bûbûn, çûbûn gundên xwe. Her ku dirêj dibû, en ku dixwestin herin gundên xwe pir dibûn. Ji wê hêrsa wan û sekina wan esreke pir hindik mabû.

Dîsa bû êvar. Roj çû ava. Dengê xelkê ê westiyayî û himîn wan ji kûr dihat. Weke ku ji bin erdê derdiket. Tenê hinan, hinên bi meraq carna serê xwe bilind dikirin, li serê Agirî dinêrîn. Mehmût Xan jî ji niv seatê, ji seatekê carekê diçû ber pencerê û li ser çiyayê Agirî dinêrî. Tenê yek kes hebû ku çavên xwe ji serê çiyayê nedileqand, ew jî Hesinker bû.

Hesinker digot, min ji wî re pigt da, Agirî de wî negire. Ew de wî pagde bigîne. Bi rûmeta rûyê agir û pîran. Agirî

120  
de ji me re Ehmed bigine.

Û îgev, geva roja çaran bû. Û bi carekê qîriniya Hesinker ji nav tariyê derket. Pagî wek gumîniya topê, gurmînek, dengê li çiyayê Agirî hat bihîstin. Ji dengê wan çiya lerizî. Ji geliyan, fena teqîna topê, dengê xelkê dihat. Herkesî li

serê Agirî nêrî. Li serê Agirî agirekî biçûk diçûrisî, wenda dibû, page dîsa xûya dibû, dîsa wenda dibû.

Ew deng bû dilgahî. Dengên dilxwegiyê tariya gevê dagirtin.

Dest bi lêdana def û meyê kirin. Keç û xortên ciwan govend gerandin. Daweteke pir mezin destpêkir.

Mehmût Xan got: "Agirî Ehmed negirt, ma ci bû?"

Îsmâil Axa got: "Ehmed ji Agiriyê ye. Agirî tigtekî bi wan nake."

Mehmût Xan qîriya. "Derew e, di vê de tigtek heye".

Û serê sibê, Ehmed li ser pigta hespê xwe, bi pigta xwe ya rast û bi xwîdan, hat li ber deriyê sarayê rawestiya. Qe lebalixê dora wî girt. Nehigtin bikeve sarayê. Ew girtin, bi rin dikana Hisoyê Hesinker. Ehmed destê Hiso maç kir. Hiso peyivî. "Pîran alîkariya te kirin, ji vê gûnde jî, bera pîr bi te re bin." Û li ser serê Ehmed pegkên agirê hesin wegand û ew pîroz kir.

Gulbahar hatibû, li qozîkê rawestiyabû. Ehmed li wê ne nêrî jî. Gulbahar ji ber vî rewga wî dilteng bû. Nepeyivî. Ma ew de waha bibûna? Wê gavê, çima vî mêrikî wilo cane xwe avêtibû mirinê û li serê çiya ar pêxistibû? Gulbahar serwextî her tigtî dibû. Bi wî awayî, evîna dilê wê jî dibû acizî.

Li pey Ehmed derket derve got: "Em herin"

Ehmed: "Em herin".

Neçûn sarayê. Li qelebalixê nenêrîn. Daweta ku ji bo wan lidar ketibû, nedîtin. Destê gêxê karwanan maç nekirin.

Li hespên xwe siwar bûn, carke din ajotin çiyê.

Li navsera çiyayê Agirî golek heye. Fena cîhê bênderekê

ye. Ava wê sûiekî tarî ye. Hersai gava bahar tê, her cîhî, sibekê hemî givanên Agirî, tên ser vê golê. Kulavên xwe davêjin ser zinarên golê yen sar û axa qehweyî. Li ser axa evîna hezar salan rûdinin. Hemî bi hev re bi bilûrên xwe sitrana xezeba Agirî dibêjin. Gava êvar dibe jî, çûkekî sipî û pir biçûk tê, bazkekî xwe li gîna birqonek dixê, difire dere. Pigtî wî, li ciyekî ne dur siya hespekî ber bi golê ve têt û bi hatina xwe re jî wenda dibe. Roj diçe ava, naçe ava, givan jî bi hev re bilûrên xwe dibirin û di nav tarîtiya çiyayê Agirî de wenda dibin, tevli tariyê dibin.

Berê hespên xwe dan gikefta ku li jora gola Kûpê ye. Li meydana ku li jora gikeftê bû, çadir danîbûn û li qiraxên jêr jî kon vegirtibûn. Rohniya konan a kêr li Agiriyê belav bûbû û dadiket. Ji çaralî bêhnek xurt û tûj ku serê merivan dog dikir, dihat. Demsala payizê ev bêhn hîn xurttir dikir. Hemî bêhn wek bêhna gêvên xerabûyî dihatin. Gîhayên ku gewitibûn û kulilkên sotayî û qemirî xigxig dikirin. Hesp bi devîkê ve girêdan. Ehmed bi hestê xwe mijûl bû, xebitî û agirek pêxist. Gulbaharê ji derûdor çilo û darik kom kirin. Bi hev re li ber êgir rûnigtin. Ehmed ji heqîbê xwe nan, penîrê sîrik derxist, bi hev re xwarin. Yek car ne peyivîn, nikaribûn li çavên hev binêrin. Tenê, gava agir qels dibû, Gulbahar diçû ji derve qeflek hejik dianî. Dûmanê qirika wan digewitand. Le herdu jî le hay ne dibûn.

Ji dur ve, ji gelî dengên pir xurt ku çiya dihejandin, dihatin. Gumînî pir dihat. Weke ku bi sedan agit bi hev re diketin. Ev deng ji qega ku ji derûdara çiyê jêdibû û diket,

dihat û derûdor tije dikir. Û di her demsalê de ji, Agirî qegayên mezin, mezin wek zinarên biçûk diketin. Dengê ketina wan li geliyan mezin dibû û deng vedida.

Gulbahar ji tirs û êga dilê xwe, çena xwe danîbû ser çpgên xwe û xwe kom kiribû. Bi qasê lepekî mabû. Li der ve bahozekî destpêkir. Û derbas bû. Aramek destpêkir. Pi-  
123

gtre hewa xweg bû. Wext nivê gevê derbas bûbû, ew her waha li hember hev rûnigtibûn. Çavên wan li ser agirê vêketî û welê mabûn.

Ne ew dikare dest bi peyivê bike ne jî ê din.

Aciziya dilê Gulbaharê hîn bi hîn gurtir dibû. Evîna wê çend xurt û kûr ve bû, diltgengiya wê ji ew çend xurt dibû.

Bi carekê re teqiya got:

"Bêje Ehmed, tigtek di dilê te de heye, wî bibêje".

Ehmed çavên xwe en girs û gag bûyî, vekir, haya wî ji hebûna Gulbaharê çêbû. Weke ku ji pir salan virde, cara pêgî Gulbaharê didît. Weke ku Gulbahar hevaleke wî ya pir ke vin bû û dixwest wê biné bîra xwe, ji nêrîna wî ev tigt diyar dibû.

Ehmed nikaribû bipeyive, nizanibû ci bibêje. Dengê Gulbaharê mîna gewatê bû. Diviya bersiva wê bihata day î. Ehmed li rûyê Gulbaharê nêrî û waha ma. Page hêdî hêdî wek mirinê bi dijwarî:

'Te ez çawa rizgar kirim, Gulbahar? Te ci da Mémo û te cane min kirî? Mémo ci girt ku cane xwe xist ber cane min? Gava Mémo ez berdama, ma nizanibû, ew de bimire? Vêna ji min re bibêje, zanibû ya nizanibû?'



Rawestiya li çavên Gulbaharê nêrî ma.

Gulbahar got: "Dizanibû. Ew dergevanê ku deriyê zînda nê veke, tu caran li tu cihî, nikare bijî û nikare xwe bisipêre tu welatan, Mémo ev zanibû. Ji lew re, ger kir ger kir û çû, xwe ji birca kelehê avêt jêr."

'Te zêr danê da, ku cane xwe da?'

"Na"

'Te saray danê ku cane xwe da?'

'Te ci dayê, Gulbahar, te ci dayê ku li hember wê, cane wîje girt? Cane xwe bi ê min guhert?'

Got: Min tigtek nedayê Ehmed" "Wî tigtek nexwest".

"Ji bo min rizgar bike?"

124

Gulbaharê peyva wî birî û got. "Min ji wî re got, tu ci bix wazî ez de bidim. Wî ci bixwestana min de bidana û cane te bikiriya, le wî tigtek nexwest."

'Te ji wî re got, tu ci bixwazî ez de bidim ne waha?'

"Min got tu ci bixwazî ez de bidim, wî tu tigt nexwest".

Û bêdeng man.

Agir hêdî hêdî vedimirî. Ji bo Gulbaharê êdî hertigt xelas bûbû. Ew bag tê gihigtîbû ku Ehmed dixwaze ci bêje.

Ehmed rabû yamçiya ser hespê anî, li erda gîha rast kir.

Ji giyayê Agirî a bêhnweg balgîv çêkir. şûrê di bin rohniya êgir de mat mat biriqî. Dirêj bû, postê xwe kigand ser xwe.

Gulbahar derket derve, destek gîha û çirpî anî, xist ser êgir. Agir gur bû. Bi dilbijokî, bi hesret û birçîtî li rûyê Ehmed nêrî. Çuqas dinêrî, dixwest hîn pirtir binêre. Ter

ne dibû, çuqas dinêrî, evîna wê gurtir dibû. Di nav bêçaretiyê de, dipertpitî. Her tigt, her tigt tamam bûbû...

Her tigt. Ev êga malkambax tam di dilê xwe de bihîst.

Nikaribû bikigîne. Nuha de ci bikira? De biçûna ku, xwe de bispartana kê? Heya hestiyên wê bi evînê tije bûbûn.

Ma birastî ji Ehmed hez nekiribû? Heger hez bikirana, bi mirina wî qiyma xwe dianî û ... Bi mémo...

Derket derve. Dihejiya. Stêrk li nav hev ketin. Daketin ser Agirî û hilkiyan. Agirî carekê ket û rabû. Stêrk û dengê Agirî di nav hev de wenda bûn. Qêrîn pêket û hilwegiya.

Gulbahar bi hembêzek gewate ket hundur, dihejiya Agirî gur bû. Her diçû rûyê Ehmed xweg dibû û bi evîn dibû.

Ehmed di xew de bû. Di evînê de bû yan wek rniriyê wes tiyayî bû? Hindik mabû Gulbahar bifetise. Her ku dinêrî, rûyê Ehmed xwegiktir dibû. Agir gûr dibû, rohnî dibû, mezin dibû. Gulbahar perpitî. Dinê li ser wê dog dibû. Kevirên gikeftê bidengekî mezin deng derdixistin. Li derve stêrk difirîn û li hev diketin. Li derûdor deng derdiket. Qiyamet 125

radibû.

Bi carekê re çavên Gulbaharê tarî bûn. Di tariyê de tenê rûyê Ehmed... Destê Gulbaharê çû ser qebza xencera wî. Bêrawestin xencer U dema xist. Heya mile wê qerimî û nema kar kir.

Gava çavên xwe vekirin, roj hêdî hêdî rohnî dibû. Bayekî hênik, bêhna xweg li derûdor digerland. Gulbaharê li ser zinara hember, di nav gulekekî rohnî de rûyê Ehmed ê nîvtarî dît. Xwe avêt berbi Ehmed de:

"Ehmed, Ehmed, Ehmed, were were meçe... Ehmed, Ehmed, Ehmed!"

Dengê wê li hemî çiyayê Agirî hâte bihîstin û vejeriya.

Ji dengê vê agît ketin geliyan. Çiya ji kûr ve hejiya.

Her ku Gulbahar ber bi wî de diçû, Ehmed ji wê dur diket.

Gulbahar radiwestiya ew jî radiwestiya. Gulbahar di

megiya, ew jî dur diket. Waha, waha hatin ser gola Kûpê

Gulbahar, Ehmed di Gola Kûpê de wenda kir. Rûyên xwe

girt nav destên xwe li ser axa gola Kûpê a qehwerengî rûnigt.

Zîq, zîq li ava gîn a bîrqonek nêrî.

Ji wê rojê vir de, en ku ji ber gola Kûpê derbas dibin,

Gulbahara ku li ser golê rûnigtiye, pore xwe yê regê tarî biser

pigta xwe de berdaye, dibînin. Serê wê di nav destê wê

de ye zîq zîq li ava gîn dinêre. Hin caran di nav ava golê de

Ehmed li ber çavên wê xûya dibe û Gulbahar dest û sînga

xwe vedike, ber bi Ehmed de dimege û diqîre. "Ehmed,

Ehmed! Tu jî li cîhê min bûna, te de waha bikira. Bes êdî.

were Ehmed, Ehmed, Ehmed!"

Gol dikele. Ehmed wenda dibe. Gulbahar wenda dibe

çûkekî sipî têt, baskekî xwe li ava gîn dixê, dawiyê ji siya

hespê tê ser golê û derbas dibe.

Her sal, gava kulîlkên biharê vedibin, li cîhan deng tije

dibin, givanên çiyayê Agirî ji çarmedor têt, kulavên xwe

davêjin ser axa golê a qehwerengî û li ser wan rûdinin. Li

126

ser axa evîna hezar salan rûdinin. Gava rohnîya sibê davêje,

bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, li sitrana xezeba

çiyayê Agirî dixin û roava çûkekî sipî tê...

127

Li navsera çiyayê Agirî, di bilindahiya car hezar û dused metroyan de golek heye. Je re gola Kûpê dibêjin. Şivanên Agirî en çeleng, çavregê bi kul, girs xwedî tiliyên zirav û di rêj jî, berî avêtina tirêjên rojê li bin stêrkên Agirî, en kom bûyî û bîrçonek, bilûrên xwe ji milên xwe datînin û dest bi lêdana xezeba çiyayê Agirî dikin.

Ev, ji avêtina rojê heya roava berdewam dike. Wê gavê, dema roj diçe ava, li ser golê çûkekî sipî û biçûk difire, dog dibe. Çûkê ku bi hemî hêza xwe difire, mîna birûskekê li erdê dikeve, dadikeve golê. Baskekî xwe li axa gîn dixê û radibe. Bi wî awayî se caran lêdixê. Page jî difire, diçe, ji ber çavan wenda dibe. Di pey çûkê sipî re, givan jî bîdeng yeko yeko, dido dido ji wê diçin, di nav tariyê de wenda di bin. Û Yagar Kemal dest bi çîroka evîna Gulbahar û Ehmed dike.

Efsaneya çiyayê Agirî, berhemeke hêja ye. Û bi awakî helbestî hatiye nivîsandin.

128

Weşanxana Çanda Kurdî

ISBN 91 861 46 31 9

\*\*

DARA GOZÊ

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

NEFEL

Dara gozê

1

DARA GOZÊ

2

Dara gozê

SERDAR ROŞAN

NEFEL

Stockholm

2002

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

3

DARA GOZÊ

Serdar Roşan: Dara gozê

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

© Serdar Roşan û Nefel

Çapa dijîtal: 2002

ISBN: 91-89687-00-0

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike  
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Nêverok

Nameyek ji bircên Amedê .....

..... 7

Êvara newrozê .....

..... 7

Li asîmanê Amedê .....

..... 8

Roja newrozê .....

... 9

Piyes .....

11

Dara gozê .....

..... 12

I - Dêwê Gola Qorqor .....

..... 16

II - Bro û »dibistan« .....

..... 20

III - Bihar û eskerên reş .....

..... 24

IV - Evîn, xweşî û zilm .....

..... 27

V - Epîlog, Dara gozê .....

..... 33

Çiyayê Zêrkan .....	34
Çîrokên Çiyayê Zêrkan .....	36
1 - Bajarê qedîm .....	36
2 - Şêrko .....	38
3 - Pîra Esmâ .....	40
4 - Newala cinan .....	42
5 - Hahîhîhî .....	46
6 - Xwe gij bike .....	48
7 - Heqê mesrefê .....	49
Komûtan .....	51
Jiyaneke weha bê mane ye! .....	55
Dergeha Evîndaran .....	58
5	
DARA GOZÊ	

## BEŞÊ KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ)

Bircanê Diyarbekirî ra mektubêke .....	
.....	71
Şewa newrozî .....	
....	71
Di asîmanê Diyarbekirî de .....	
.....	72
Rocê newrozî .....	
....	73
Piyas .....	
75	
Gozêre .....	76
1 - Hûtê Gola Qorqorî .....	
.....	80
2 - Bro û »dibistane« .....	
.....	84
3 - Wesar û eskero siya .....	
.....	88
4 - Hezkerdiş, rindî û zilm .....	
.....	91
Epîlog - Gozêre .....	
.....	97
6	

Nameyek ji bircên Amedê

Biracan,

Belê, newroz îsal ji salên berê guhertî hate pîrozkirin. Çend meh berê



Belediya Diyarbekirê li ser daxwaza rûniştvanên bajêr biryar dabû,  
da ko  
newroz bi şêweyeke dewlemend bête pîrozkirin. Vêca ez dê li gorî  
ko zi-  
manê min bigere, taqeta min ya nivisînê dest bide, ji we re şahî û  
şêweya  
pîrozkirina newroza îsal binîm ziman. Bi nivîsê, bi kelîmeyan  
liberçavraxistina şahiyên newrozê bi hemî xweşî û rengan di vê  
nameyê  
de dijwar e. Lê ji ber xusûsiyeta namenivisînê van rêzên han  
dinivîsim.  
Heke paşê wextê we hebe û hûn li fîlmên şahiyên newrozê temaşe  
bikin,  
hûn dê têbigêhin mebesta min çî ye.  
Ez dixwazim şahî û pîroziyên vê rojê di bin çend xalan de nîşan  
bikim.  
Li vir ev tiştên, ez dê ji bo we bînim ber çavan ne yên ko tenê min  
bi xwe  
dîtine, herweha şahiyên ko li cihên din çêbûne jî bi rêya hevalên  
xwe ez  
dê ji we re diyar bikim. Bê ko dirêj bikim û serê we biêşînim, de ka  
werin  
em bi hev re rasterast herin temaşeya operaya Memê Alan.  
Êvara newrozê  
Êvara newrozê, piştî ko tariyê erd hilçini, di saet heştan de, li  
navenda tiy-  
atroyê operaya Memê Alan dest pê kir. Li salonê cihekî tenê jî vala  
ne

mabû. Li gel ko navenda tiyatroyê ciheke mezin e jî, cardin mirov dil  
dikir ko saloneke mezintir dê çêtir bana. Ji ber ev cara yekemîn bû  
ko

destana Memê Alan li bajarê Amedê bi awayeke rêkûpêk li pêş  
çavan mî-

na tabloyeke rengîn ko hunermendek rengên xwe li ser tabloyê bi  
sebir û

diqet bi cih bike dihate vejandin.

Herçiqas êvara newrozê bi sedan kes li ber deriyê navenda  
tiyatroyê, ji

bo ko bilêtek bi dest bixin civiyan jî, çî mixabin hêviya wan bi cîh ne  
hat.

Ji xwe bilêtin vê şevê du meh berê xilas bû bûn. Dihate gotin ko vê  
carê

peyayên bazara reş, reşfiroş bêkar mabûn.

Ez pir dilşikestî me, ji ber ko ez nikarim vê Operayê bi nivîsê, bi hemî  
7

## DARA GOZÊ

huner û xweşiya wê û di wexta temaşekirinê de ew hestên bi mirovî  
re

peyda dibin, bînim ziman. Lê belê gava mirovî temaşayî operayê  
dikir,

mirov diçû dinya û jiyaneke din. Li wê dinyayê mêr hebûn bi xof û  
hey-

bet bûn. Jin hebûn bi rindiya xwe horî bûn. Mirov geh li buhiştê geh  
li

dojehê bû. Geh li xewnên şêrîn, geh li zindanê bû. Xewn û xeyal, tirs  
û  
heybet, mêranî û bêbextî, qencî û nerindî, hejarî û dewlemendî,  
hevaltî û  
neyarî, evîndarî û kîndarî, bi kurtî te digote mirov birek ji dîroka în-  
saniyetê dijî. Hemî ev şêweyên tabloyan li ber çavên mirovî şikil  
digirtin  
û dihatin guhertin. Bi rehetî ez dikarim bêjim ko rihê dengbêjên me  
yên  
koçkirî şah bû. Dengê hunermendan pêl bi pêl, di nav gelî û  
newalan, di  
ser çîyan re li asîmanê welatê me bi çar aliyan ve xweşî û şadî belav  
kir.  
Dibêjin, îşev li asîmanê çiyayê Agrî, stêrka Ehmedê Xanî ji her şevê  
bêtir  
şewq dida. Gelek kes kelegirî bûn. Keçên ciwan ji ber evîna Mem û  
Zînê  
di wê salona tarî de bihar û payîz bi bîr anîn. Xortên ciwan ji wan ne  
kêmtir bûn. Heke dest bida dê gelek ciwanmêran êriş bibirana ser  
sehneyê ji bo tolhildana Memê. Belê, mirov nizane di temaşa vê  
operayê  
de çi his bi temaşevanan re peydabûn. Tenê Xwedê û hisdarên me  
dizanin kîjan hest di ruhê wan de vejiyan...  
Di êvara newrozê de televîzyonê ev opera yekser nîşan dida. Kesên  
ko  
ne karibûn biçin temaşeyê qîma xwe bi televîzyonê anîn. Lê divê  
bête

gotin ko piştî bidawîbûna operayê, vê êvara newrozê temaşevanên  
oper-  
ayê, bi xeyalên cûr bi cûr xwe berdan nav tarîtiya şevê. Her mirovek  
bi  
xeyal û hêviyên xwe, bi raman û daxwazin xwe kêfxweş an xemgîn...  
Helbet pîrozkirina newrozê ne tenê bi operaya Memê Alan dihate  
pê.  
Piştî operayê li ser daxwaza hin hevalan em li helîkopterekî siwar  
bûn da  
ko em gerekê li asîmanê Diyarbekirê pêk bînin û fekin, ka di vê şeva  
tarî  
de ji bilindahiyê bajêr çawa xuya dike. Li min bibihurin. Ez dizanim  
taswîreke têr nahête pêş. Lê wek min berê jî gotibû ez dê hewl  
bidim da  
ko bi kêmasî dîmenekê li ber çavên we biafirînim heke ev dîmen pir  
rengîn ne be jî.  
Li asîmanê Amedê  
Belê, em bi helîkopterê li asîmanê Diyarbekirê di tariya şeva  
newrozê de  
digerin. Ji siûdê me re, tu ewrek li asîman naxuye. Şeveke çîlsayî. Li  
asî-  
man stêrk bi hemî xweşiya xwe li me temaşe dikin. Ji her şevê  
zêdetir bi  
ronahî ne. Tu dibê qey ew jî îşev newrozê bi me re pîroz dikin. Ji jor  
de  
8

em temaşe dîkin, bajar di nav rengan de maye. Ma gelo ev heftreng  
e, di  
vê şeva tarî de xuya dibe?! Na na. Ev heftrenga me ye. Heftrenga  
newrozê  
ye. Belê, gava em nêzîkî li bajarê Amedê yê kevin, bircên li bajêr  
pêçayî  
dîkin, bi xweşiya dîmena xuyayî mirov dikeve nav xeyalan. Bircên  
Diyarbekirê seranser hatine xemilandin. Ronahî wek avê diherike.  
Bircên rengîn li ber çavên mirovî şiklên pircûre distînin. Carina wek  
keziyên hunandî yên Xeca li çiyayê Sîpanê dihêne xuyakirin. Heger  
mirov hay jê nebe ko di helîkopterekê de ye, bê guman mirov dil  
dike ko  
xwe ji jor berde nav vê daristana keziyan... Bi tevgera helîkopterê  
îcar  
wêneyeke din dihê vejînê. Bircên Amedê kofiyên jinên kurdan  
dihînin  
ber çavên mirovî. Ew kofiyên rengîn, bi zêran xemilandî xuya dibin.  
Amed li ber çavên mirov dibe wek jineke bedew, ko di tariya şevê  
de  
dilive. Avahiyên bilind, keziyên hunandî, bircên belek tabloya  
huner-  
mend tamam dîkin. Dilê mirov bi pêl dibe, germbûna canê mirov bi-  
hêzgerîna xwînê dixê bîra mirovî. Em li asîmanê Amedê, bi dilekî  
germ li  
dilê bajêr temaşe dîkin...  
Li rojhelata bajar çemê Dicle diherike. Ji ber ronahiya bajêr, dema  
mirov ji jor mêze dike, dibîne ko Dicle bi şêweyêke din diherike, ron-

ahiyê ava Dîcle guhertiye. Ji pêl û herikandina avê nebe ez dê bêjim  
ew

ne Dîcle ye... Agirê newrozê li ser birca bakûr ya herî bilind bi hemî  
pîroziya xwe ber bi asîmanî pêl dide. Tu dibê ji bo rizgarbûna Memo,  
Tacdîn xaniyê xwe şewitandiyê. dî Padîşah li ser siniya ber xwe  
kakilên

gozan nabîne. Agirê newrozê nema dara gozê tenê dihêle. Li  
asîmanê

Amedê fîşekên hewayî diteqin. Belê, bi rengên guhertî li asîmanê bi  
fîşekên hewayî »newroz Pîroz Be« dihête nivisîn. Li bin asîmanê  
Diyarbekirê di vê şeva tarî de gelek tişt xuya dibin... Ez serê we  
neêşînim.

Roja newrozê

Wek hûn dizanin roja newrozê em kar nakin. Cejn e. Piştî taştê em  
çend

heval bi hev re derketin nav bajêr. Me got ka em binêrin di vê roja  
xweş

de diyarbekirî çawa newroza xwe pîroz dikin. Me berê xwe da nav  
bajêr,

bajarê qedîm. Li gel ko ne pêwist e ez bêjim jî, lê rûniştvanên bajêr  
bi

cilên xwe yên neteweyî regekî din didan vê rojê. Li ser riya xwe em  
pê

hesiyan ko di nav bajêr de trafîk rawestayê. Paşê ji me re gotin ko ji  
ber

şahiyê li nav bajêr trafîk dane rawestanê.

Belê, ez çawa bêjim. Ji çar aliyên Amedê dengê def û zirnê bilind  
dibû.

## DARA GOZÊ

Di vê roja xweş de li ser daxwaza belediya Diyarbekirê ji belediyên  
 ba-  
 jarên me yên din grûbên govendê hatibûn hinartin. Nuha ji çar  
 aliyên  
 bajêr ev grûbên govendê bi lîstikên xwe yên mehelî, bi hunermendî  
 li  
 kolanên Amedê ber bi meydana Şêx Seîd diherikîn. Her grûbek bi  
 kê-  
 masî ji sed kesî pêk hatibû. Xortên çeleng, keçên bedew mil di milê  
 hev  
 de pêl bi pêl di tevgerê de bûn. Te di got qey mêrgên zozanan yên  
 Serhedê ne, bayekî sivik vê deryaya gul û kulîlkan dihejîne. Xelkê  
 bajêr li  
 kêlekên riyan temaşeyî wan dikir. Hin caran, bi tilîlî û çepikên xwe,  
 ew jî  
 beşdarê govendê dibûn.  
 Piştî grûbeke govendê grûbên tiyatro yên pêkenînê derdiketin.  
 Herçî  
 bi derketina wan komikan, zarok gelekî kêfxweş dibûn. Zarokan bi  
 hewar û qêrîn dixwest li ser milên mezinên xwe temaşeyî wan  
 komikên  
 qeşmeran bikin. Bi rastî wan grûbên pêkenînê jî kêfeke cuda dida  
 vê ro-  
 jê û ji ser kêfa zarokan re tişteki tune bû. Zarokan bi gulvedanek  
 rengîn

kêf dikir û dikenyan...

Piştî demekê ew grûbên govendê, hemî gihaştin meydana Şêx Seîdî.

Li

wê derê serokê belediyê axaftineke kurt kir. Piştî axaftinê vêca hemî

grûban bi hev re, bi heft def û zirneyan govend girêdan. Bi vê dîmena

xuyayî sosin, beybûn, pîrpizêk, nêrgiz û gulvedana darên behîvan dihate

ber çavên mirovî. Vê deng û dîmenê, wek vejîn û xumîna tebîetê ko di bi-

hara welatê me de rûdide, bi şêweyeke tesîrkar di kurahiya hestên mirovî

de xwe dida hiskirinê. Herê hûn dizanin û min berê jî gotibû; ez êdî nikarim vê tabloyê bînim zimanî. Xwezî şaîra me ya bi nav û deng, Binevşa Xezalê li vir bûya û ji bedêla min wê ji we re binivîsiya...

Li der û dora Diyarbekirê, amedî li seyrangehan, li nav gul û kulîlkan, newrozê bi şahiyên renga reng pîroz dikin. Lê li vir berê ko ez ji bîr bikim,

divê ez bêjim: Îro roj roja evîndaran e. Yê evîndar xwe ji malbatên xwe

bi dûr diêxin, da ko nêzîkê dildarên xwe bibin. Bi sedan keç û xortên Amedê li rex çemê Dicle dest li destê hev, di nav xewn û xeyalan de, bi

gotinên şêrîn bi hev re dipeyîvin, ramîsanên hingivîn ji hev dixwazin...

Gulên sor, gulên pembe û xemrî dibişkifin. Çemê Dicle bi bar e, barê wî



giran e, lê bi ken û kêfxweşî diherike. Ji Mem û Zîna Cizîra Botan re silavên keç û xortên Amedê dibe. Evîndar bi hêviya ko bêgehêjin

Mem û

Zînê qevdê kulîlkan, nêrgizan, gulên sor û xemrî diavêjin çemê evînê... Û

dibêjin her sal di bîst û yekê Adarê de Mem û Zîn divejin û li kolanên Cizîra Botan, li rex çemê Dîcleyê tenê ji yên evîndar re xuya dibin...

Ji birçînan em gêj bûn... Ji kêf û şahiya vê rojê me xwarin ji bîr kir.

Em

10

rabûn çûn malê. Me bêhna xwe stend û pişt re li kêleka sifreyeke mîrane

em rûniştin me xwarin xwar... varê em dê herin stadyûma mezin.

Piyas

Belê, em nuha ketine hundirê stadyûmê û em li cihê xwe rûniştine.

Hinek paşê dê program dest pê bike. Program ji çend babetan pêk dihê.

Lê ez dê tenê ji we ra behsa piyasa Padîşahî bikim. Piyas ji alî

Navenda

Kulturê hatiye bidarxistin û bi şêweyê hevdem hatiye şirovekirin.

Li

stadyûmê cihê vala ne maye. Nêzîkê bîst hezar temaşevan dê li

piyasê

fekin. Herweha tv jî dê yekser vê lîstîkê nîşan bide.

Belê, piyasa bi kêmkirina ronahiyê û bi musîkeke xof dest pê dike.

Pêlên

ricfê mirovî digrin. Padîshahek bi hemî xof û nerindiya xwe, bi tevî  
leşk-  
erên xwe ve dikeve hundir. Em niha li dinyayeke din, dinyayeke  
kevnar,  
ji vir bi hezar salan berê dijîn. Pêlên ronahiyê, cil û bergên padîşah  
û leşk-  
erên wî, motifên xuya dibin hemî bi hev re wan hestan bi insanî re  
çêdikin. Lîstikvan dipeyîvin, lê em dengê wan nabihîzin. Ji tevger û  
musîkê tiştên ko rûdidin mirov ji seyra piyesê fahm dike. Ji çar  
aliyên  
meydana piyesê hêdî hêdî mirovên din xuya dibin. Jiyana însanên  
wê  
demê xuya dibe. Em hesinkar, goçkar, şivan, cotyar, rezvan û gelek  
birên  
din ji xelkê dibînin. Padîşah ne rahet e. Eskerên wî di lez û bezê de  
ne.  
Pêlên xofa leşkerên padîşah tirsek mezin di nav xelkê de peyda  
dikin. Her  
roja ko diçe rûyê zemîn ber bi dogehê ve tê guhertin. Jiyana dibe  
ezabeke  
giran... Piştî demekê ji xelkê hin mirov dikevin tevgerê... Musîk  
mirovî  
dihejîne... Ji çar kenarên stadyûmê deng dihê... Çirûskên agirî  
dixuyên...  
Tîrêjên ronahiyê carna geş dibin. Bi keftelefteke mezin, di nav mij û  
dux-  
anê de, ronahî tarîtiya şevê hiltîne. Padîşah û eskerên wî nikarin  
xwe li ber

agirî û tîrêjên ronahiyê biparêzin. Musîk dihête guhertin. Kêfxweşî  
û şahî  
him bi musîk him jî bi piyesê dihê pîrozkirin... Bîst hezar temaşevan  
li  
çepikan didin... Amedî ji »dîroka« xwe rûpelin dijîn. Bi serbilindî û  
xem-  
revînî ji stadyûmê bi derdikevin. Ne dûr e ko wekî min di xewnên  
gelek  
temaşevanan de jî, piyes bête dubarekirin...  
Bi kurtî û bi giştî newroza me ya îsal li bajarê Amedê bi vê şêweyê  
hate  
pîrozkirin. Careke din newroza we hemiyar pîroz be. Her roja we bi  
şahî  
û kêfxweşiyê ji xeman bi dûr bi dawî bê.

Diyarbakir, 21.03.2021

11

DARA GOZÊ

Dara gozê

Ez li gundekî bi cih bûme; jiyana min, mala min, xweşî û nexweşiyên  
min, derbasbûna min hemî li vê derê ne. Dixwazim berî ko ez behsa  
xwe  
bikim, bi kurtî be jî, gundê xwe bidim naskirin. Berî ko ez bêm  
dinyayê  
û rehên xwe bera erdê bidim û bi xweşî li ser rûyê zemînê şax bidim  
û  
bilind bibim, avakarên vî gundî hatine li vir bi cih bûne û ev gund  
ava

kirine. Di xortaniya xwe de, min carekê dil hebû ko ez ji gundiyan  
bipir-  
sim ka gelo ew ji ko hatine, berê li ko bûn, lê çî mixabin min cesaret  
ne  
kir. Min got ew dê bi min bikenin; henekê xwe bi min bikin; dê bêjin  
tu  
kî yî, yê ko jiyana daye te em in; tu li ber destê me mezin bûyî; tu  
çawa  
pîrsên welê ji me dikî!  
Ev gundê ez tê de dijîm li quntara çiyayekê bilind hatiye ava kirin.  
Erê  
rast e pir ne bilind e, lê li gorî der û dora xwe çiyayekê berz dihê qe-  
bûlkin. Li quntara çiyê bi firehî yek-du û bi dirêjahî bi çend km  
pehnaheyek heye. Biniya vê pehnaheyê bilindahiyek -ku ji zincîra  
kevir û  
zinaran pêk dihê- mîna dîwarekê tebiî li biniya gund seranser rêz  
bûye. Ev  
cihê gund lê avabûye dişibe sedirekê; tu dibê qey ev gundê ha li ser  
vê  
sedirê rûniştîye; piştî xwe daye çiya û lingên xwe jî ber bi jêr ber  
dane. Li  
gorî gundên der û dor mezin e. Ji jor, serê çiyayê xaniyên gund mîna  
mey-  
daneke fireh xuya dibin; ji lewre serbanê wan bi hev ve girêdayî  
hatiye  
avakirin û pîrê caran dîwarê kêlekan bi cîranan re şîrîk hatiye  
danîn.  
Kuçeyên navbera komikên xaniyan teng in û ji dûr zêde xuya nabin.

Zivistanan hewa sar e; berf gelekî dibare; ji rojingên xaniyan  
duxaneke  
tenik bilind dibe; ji xwe gava yekî xerîb ji gundên pişt çiya bê û ji jor,  
ser  
çiyê, mêze bike eger ji duxan nebe dê bîr nebe ko gundekî mezin di  
bin  
berfa zivistanê de bi cih e.  
Hin bilindahiyên çiyê bi darên mazî pêçayî ne; lê hêla rojava rût û  
qut  
e. Niha jî baş tê bîra min, heta dema xortaniya min, ev der û dor  
hemî  
daristan bûn. Wê gavê gundê me jî ne zêde qelebalix bû. Di nav wan  
daristanan de her cure teyr û tilûr, heywan û dirinde peyda dibûn.  
Gurên  
har carina dihatin nêzîkî gund û dizûriyan. Daristan warê hirç û  
berazên  
nekedî, rovî, kuze, kerguh, sihûrî û gelekên din bûn; li nav daristanê  
ev  
12

cûre heywan li dinya xwe dijiyan. Li ser dirindeyan gelek meselok û  
çîrok  
hene; lê niha ne wext e ko ez behs bikim. Bi mezinbûna gund,  
zêdebûna  
rûniştevanan, vekirina erd û jêkirina daran ew daristan winda bûn.  
Niha  
mîna seriyekî gurrî li vir û li wir çend dar mane. Ez ji we re sirekê  
xwe

bêjim lê ji kesê re mebêjin. Bi rastî ez gelekî ditirsiyam; min digot wê ro-

jek dor bê min jî, dê werin serî min jî bifirînin; ji xweşî û bextiyariya dinyayê min bêpar bihêlin; ji ber ko li ber çavên min çend xwîşk û bi-

rayên min bi xîzarên mezin di erdê rakirin. Ez bi rojan giriyam. Girîna min him jibo wan him jî bi halê min, ji tirsê min bû. Lê şikir ji Xwedê re

heta niha dor ne hatiye min.

Ber bi rojhelat çiya ji bilindahî û newalan pêkdihên. Li hêla rojhelat bi-

landahiyên zincîra çiyên bi carekê qut nabin; xwe bi dirêjahiya bi deh km

domdikin. Quntarên bilindahiyên bi rezan pêçayî ne; di nav rezan de ci-

hina darên hirmî û behîvan bilind dibin; ji hêla tirî û berhemên ji tiriya

gundê me gelekî dewlemend e.

Ji cihê xwe ez hemî wan gund û gomên ko li hêla bakur hatine avakirin

dibînim. Ji me ne gelekî dûr in. Dûrbûna hin ji wan ji gundê me bi meşê

qasê saetekê yê dî jî du saetan rê ye. Gundên ko li paş çiya dikevin ji min

ne xuyane; derheqê wan de zêde tiştêkî nizamim; lê gava hin mirov ji wan

gundan bi mêvanî dihên gundê me, ez bi dizî be jî hin zanyariyan ji wan

werdigirim. Gundiyên min û mêvanên ji wan gundan ji xwe re dikevin  
nav sihetê, bi saetan bi hev re dipeyîvin; behsa pez û dewaran dikin; li  
ser erd û zeviyan, rez û bexçan diaxifin. Ew dibên qey hema ew dipeyivin  
û gotinên wan winda dibin, diçin. Lê ne rast e. Ez şahidê wan im.  
Dengê  
ko ji devê wan dertê li hewa belav dibe û pêl bi pêl digêje min. Ez jî bi vî  
awayî ji şolên wan haydar dibim.  
Hûn zanin ez ji çi pir hez dikim? Rebenên Xwedê ma hûn dê ji ko zanibin. De hema bêê ko ez we aciz bikim, ez ê bêjim. Ez ji govendên wan  
û herweha ji şevbuhêrkên wan yên dawiya payizê û zivistanê hez dikim.  
Her şev li malekî kom dibin û dipeyîvin. Xwediyê malê li gorî taqeta xwe  
ji mêvanên xwe re bastêx, benî, mewij û mêweyên hişk, goştê lepikan,  
dendikê behîvan û gozan li ser siniyê rêz dike. Eger di şevbuhêrkên wan  
de dengbêjek jî hazir bibe wê gavê kêf kêfa cemaetê û ya min e. Bi bilind-  
bûna dengê dengbêj re bêdengiyê xwe berdide ser gund û tu dibê qey  
kesek nefes nade û nastîne. Carina ez difikirim, gelo ev gundî çima

hewqas ji van kilaman hez dikin? Eger hûn zanibin û ji min re bêjin  
ez dê

gelekî kêfxweş bibim... Govend. Qet ne bêjin. Ma ji dawetan xweştir  
çi

13

DARA GOZÊ

heye, gava gundî hemî bi hev re dawetê digerînin; jin, mêr, keç, xort  
û

zarok hemî li meydana dawetê bi şahî kêf dikin û keç û xort bi dilekî  
ler-

zok nêzîkî hev dibin; dest di destê hev de xwe dihejînin; ez jî bi vî  
halê

xwe beşdarî şahiya wan dibim; bi pel û şaxên xwe li ber bayê sivik  
pêl

didim. Yek ji xweşiyên dawetan jî, êvaran di dîlanê de li hemberê  
hev

(bêrîte) gotina stranan ji alî du refên govendgêran e. Ya din jî di  
derengiyên şevê de lêdana bilûrê ye. Bilûrvan bi nazdarî bilûra xwe  
ji

berîka xwe derdixe; hêdî hêdî di nav lêvên xwe de bi cih dike û  
bêdengiya

şevê bi bilûra xwe dişikîne; çîrok û serpêhatiyên bi bilûra xwe  
dilorîne.

Gava bilûrvan şerê gur û seg lêdide tu dibê qey bûyer vaye li ber  
çavên

wan hemî guhdaran diqewime; dema gur zora seg dibe bilûr bi  
xemgînî



û bi êş deng derdixe; ji ruyên wan dixuyê ko guhdar jî li bin tesîrê  
ne; lê  
wexta seg zorbirî li gur dike êdî bilûr dikele; şahî ye; pê re rûyê  
guhbaran  
vedibe...  
Tu rastiyê bêjî, eger ji van govend û şevbuhêrkan nebe li quntara vî  
çiyayî kuştina wext wê gelekî dijwar be. Li ber bayê bakûrê û berfa  
zivis-  
tanê ez bi van şahî û sohbetên wan germ dibim û sebra xwe tînim.  
Ma ew  
jî tunebana Xwedê zane dê çiqas hucreyên canê min bimirana...  
Ez bi hebûna xwe deyndarê vî gundî me. Bi saya rûniştevanên wî ez  
heme û dijîm. Ji lewre ji wan gelekî hez dikim. Çewa ez hez nekim.  
Kî di  
şûna min de be, dê her welê bêje. Ez û ew, em bûne dost. Çi baş çi  
xirab  
gelek tiştên me têkel bûne; me di zivistanên xedar û havînên  
hişkegerm  
de, bi hev re, di ber xwe daye; li vê dinyayê tu kesekî nikare me ji  
hev  
biqetîne. Ez wan hemiyar baş nas dikim. Piçûk heta bi mezinên  
wan, pez  
û dewarên wan, keç û xortên wan hemî bi min re bi şêweyekî şirîk  
in. Tu  
lehzeyekê tune ko ez ji hawirdor tiştêkî ne bihîsim an jî nebînim. De  
vê-  
ca ji we re çi bêjim; êdî hûn dizanin em çiqasî nêzîkî hev in.

Ez xwe dêspêrim wijdanê we xwendevanan û berê gotinan piçekî  
ber bi  
xwe ve badidim. Ji kengê ve ez li vir im, çawa li vir bi cih bûme nayê  
bîra  
min. Ji lewre li min negirin. Tu rastiyê bêjê ez gelekî kal bûme; wek  
hûn  
dizanin dema mirov kal dibe êdî nikare her tiştî bi bîr bîne. Ne dût  
e ko  
bi sedan zivistan û havîn min dîtine. Carina difikirim. Ma gelo  
mimkun  
e ko mirov hertiştê jiyayî bi bîr bîne. Hûn ji min pirs bikin, eger bi  
temamî nebe jî bûyerên girîng zû bi zû ji bîra mirovî naçin. Ew bûyer  
xwe  
di quncikekê zanyariya mirovî de didin ser hev; bi sebir li hêviya roja  
xwe  
disekin. Eger siûdê wan hebe rojek ji rojan pêlên lêgerînê û  
bîranînê di-  
gehîjin quncika wan û bi awayekî dilxweş an jî xemgîn wan divejînin.  
Bi

14

vejîna wan kevnezanîn û jiyandeyan mirov careke din dijî. Hin mirov  
bi  
kêfxweşî vê yeka han her roj bi bîr tînin; di çarçoweya mejî û fikrî  
de tenê  
be jî, vê yekê her dubare dîkin û pê sebra dilê xwe dihînin. Lê her  
car

mirov rastê kêfxweşî û rindiyê nayê; carina bê hemdê mirov be jî,  
bûy-  
erên tehl, bûyerên bi kul û derd xwe berpêş dikin û mirovî dixin nav  
tor-  
ra xwe. Bi kul û keser mirovî dihejînin; xemgîn dikin. Herçiqas mirov  
dixwaze ji van bîranînan lehzeyek zûtir rizgar bibe jî, lê ev karekî ne  
hêsa  
ye. Loma ez neçar im behsa bûyerên rind û nerind, dilxweş û  
xemgîn,  
tehl û şêrîn ango hemî cûre bûyeran bikim; ma jiyan bi xwe ne ev  
e?  
Eger rojek ji rojan di demsala bihar an havînê de riya we bi mekanê  
min bikeve, werin li cem min pal bidin û guh bidin min, wê gavê hûn  
dê  
mebesta min têbigêhin. Bi rastî bi carekê tenê jî çavên we bi min  
bikevin  
hûn ê hemî jiyana min ya bihurî di qermîçokên rûyê min de bibînin.  
Di  
bin van qermîçokan de destê bi destê jiyana min û herweha bûyer,  
ser-  
pêhatî û bîranînên min bi cih in.  
De ka werin ez û hûn em li kêleka hev rûnin, qasê ko ez karibim û  
taqe-  
ta min dest bide; ez dê ji we ra bîranînên xwe bêjim. Lê wek hûn  
dizanin,  
ev tiştên ko ez li vir behs bikim bi piranî di payîza jiyana mirovî de  
xwe  
dilivînin. Ew jî naxwazin bê wesîqe û qeyd koç bikin. Ji lewre xwe

dilivînin û dixwazin eger bi nivisê ne be jî, bi şêweya kultur û zanîna  
de-  
vkî, di zanîna hin mirovên din de jiyana xwe bidomînin û di zincîra  
bîranînan de cihê xwe bigrin.  
Ma hûn dibêjin heqê wan tune ye? Ka ji min re bêjin, gelo tiştê an  
ke-  
sek heye ko bi daxwaza xwe bê ko rêç û kevnepoşek li pey xwe  
bihêle, serê  
xwe hilde û ji vê dinyayê koç bike? Hûn ji min pirs bikin ez bi xwe bi  
vê  
yekê ne bawer im. Ji lewre her tiştê ko heye hertim di hewldanekê  
de ye,  
da ko karibe xwe bide jiyandin û berdewamkirin. Ji ber vê yekê ji  
erd heta  
bi asîman heqê bîranînan jî heye ko ew jî bixwazin hertim xwe nuh  
bikin  
û bên vejîn.  
Pêlên hizirkirinê di serê min de bi van gerrînekan doş dibin  
diherikin.  
Herê, tu bi xwedê tu çî dibêjî, ev yeka hanê dikeve serê te, ango ji  
te re  
meqûl e, tu û kêfa te, eger tu meraq nekî ka ez dê çî bêjim, te divê  
hema  
li vir bê ko tu rêzek tenê jî bidomîni xwendinê qut bike, mefikire!  
Tu yê  
karibî?!  
Vaye ez ji we re ji jiyana xwe û jiyana dostên xwe çend bûyeran,  
nimûneyan dibêjim.

## DARA GOZÊ

I - Dêwê Gola Qorqor

Nêzîkî sed sal berê rojek ji rojên payîzê, gundî li maleke mezin  
runiştî di

nava sohbeteke germ de bûn. Behsa mêranî, tirs, cin, perî û hûtan  
dihate

kirin. Derengê şevê, gotin hat ser Dêwê Gola Qorqor. Peyv  
gerandin;

çûn û hatin û li dawiyê gotin, »tu kes newêre bi şev here wê derê.«  
Husên

ji nava cemaetê got »ez diwêrim.« Newêrî, diwêrim, welhasil rabûn  
şert

girtin; gotin »eger tu sibe êvarê herî û şeva xwe li ber gola Qorqor  
bibuhurînê em dê du çewal genim bidin te”. Li hev kirin. Derengê  
şevê

gundî rabûn ser xwe, belav bûn; berê xwe dan malên xwe.

Divê roja dî ji êvarê heta şefeqa sibê Husên bi tena serê xwe li  
newala

Qorqor li ber golê bimaya. Tu rastiye bêjî Husên bi xwe jî poşman  
bû bû

û ditirsiya; lê carekê soz dabû û bi ser de jî şert girtibûn. Jina wî Zerê  
bi

heyran qurban jê re lava kir; li ber wî gerriya, bê fêde bû. Bi tirs û  
heye-

can heya nimêja esrê Husên li gund ma. Ber bi êvarê rabû tifinga  
xwe ya

qapsulî hilda; du nanên tenûrê, du serî pîvaz, hinek toraq û hin xwey ko  
xistibû nav kevnikekî, xistin tûrikê xwe û berê xwe da newala Qorqor.  
Newal bi qasî çil deqîqe bi meşê ji gund dûr bû. Li ser rê wî xwe bi xwe  
got »berî ko herim newalê, ez ê herim û dibe ko siûdê min hebe û ez çend  
kewan bikujim da ko êvarê li ber golê şîva min piçek zengîn be.«  
Husên  
riya xwe bi kaniya Maran xist; carina ber bi êvaran ji bo vexwarina avê  
kew dihatine ser kaniyê; Husên ji xwe re kozikek ji çilo çêkir û bi hêviya  
ko kewan bikuje kete kozikê. Piştî bîstekê refekî kewan xwe li ser kaniyê  
danî. Husên tifinga xwe hilanî, qundaxa tifingê baş li milê xwe bi cih kir;  
nîşan girt û tiliya xwe ya destê rastê li lingê tifingê şidand. Bi gumîna tifingê re hin kew bi hewa ketin hin jî li erdê pirpitîn. Husên rabû û ber  
bi kewên pirpitî baz da; sê kewên gozel dipirpitîn. Husên her sê jî ser jê  
kirin û kewên xwe xistin tûrê xwe û ber bi gola Qorqor meşiya.  
Tarî hêdî hêdî erd hildiçinî, gava Husên gihaşte ser golê êdî zêde wex-  
tê wî nema bû. Bi ecele hin hişkedar û pûş da ser hev û li ber golê cihê xwe

nîşan kir. Ji bêsiûdiya wî re şeveke tarî, şevereş bû. Mirov ne dikarî  
pêşiya  
xwe bibîne. Husên hin pûşî, heste û berheste ji berîka xwe derxistin;  
li  
16

destê xwe yê çepê pûşî û li kêleka pûşiyê berheste bi cih kirin.  
Hesteyê  
agirpêxistinê bi hêz li berheste da. Piştî çend caran ko bi hêz heste  
û  
berheste li hev ketin çirûskan pûşî girt. Husên hema bi lez pif kir û  
bi vî  
şeweyî agir pê xist. Piştî mideteke kurt der û dor êdî ji ronahiya agir  
kifş  
dibû.  
Husên kew ji tûr derxistin, perikên wan rakirin; rabû çû ber golê,  
nava  
kewan paqij kir û vegeriya; hat li ber agir rûnişt. Bi kêrê sê şivên rast  
wekî  
şîşan jibo biraştina kewan teraştin û paqij kirin. Kewên xwe xwê  
kirin û  
di şivên bi niyeta şîşan de bi cih kirin û ji bo xwê baş tehma xwe bide  
goşt,  
kewên bi şîşkirî li kêleka xwe li ser keviran danîn.  
Agir êdî xweş bû bû. Li ber agir rûniştî bala wî çû ser pêtên agirî û bi  
pêtên agir re ew kete nav xeyalan. Dinyaya cin û periyan, dinyaya  
dêw û

hûtan di mejiyê Husên de vejî. Çîrok û serpêhatiyên tirsê, li ber  
çavên wî  
bi rih dibûn. Taritiya şevê wek kaporekî xwe li wî dipêça; nêzîkî wî  
dibû;  
bê hemdê xwe, xwe piçeke din jî ber bi agir da; agir jê re bû bû  
piştmêrekî,  
bi tena serê xwe li vê newalê di vê şevereşê de xwe bê mecal his  
kir. Bala  
xwe bêtir da pêtên agirî. Pêtên agir li ber çavên wî şikilên pirr cûre  
di-  
girtin. Jina wî Zerê hate bîra wî. Guliyên Zerê li ber çavên wî hil  
dibûn;  
dirêj dibûn; dibiriqîn; birû, çav, lêvên wê yên sorgulî xuya dibûn;  
çavên  
Husên ber bi jêr daketin û gerdana wê, pêsîrên wê yên hinarî xuya  
dibûn,  
Husên bi niyeta ko dest pisîrên Zerê bide, destê xwe dirêj kir; şûna  
ko  
memikên Zerê bidest bixe, ji şewat û êşa agirî destê xwe paşte  
kişand û  
veciniqî. Li der û dora xwe bi awayekî şaşbûyî mêze kir. Mîna ko  
bêje ez  
li vir çi dikim, ka Zerê ko de çû? Piştî kêlekî li xwe verqilî; soza wî û  
gundiyan, şertê wan hate bîra wî. Ji kûrahiya dil axînek kişand. Çiqas  
wext bi ser re çûbû, wî ne dizanî. Agir sist bû bû. Çend dar avêtin  
ser agirî  
û pê agir xweş kir. Rabû çû ser golê ser û çavê xwe şûşt û vegeriya  
cihê



xwe.

Ji bo biraştinê li kêleka agirî kevir danîn, kewên bi şivan ve kirî rakirin

û her sê kewên xwe li ser kuçikên çêkirî bi cih kirin. Herçi qas wî ne dizanî

lê êdî şev dereng û nivî bû bû. Şeveke bêdeng, eger ji dengê şewata daran

û qir qira qirqurokan nebana tu dengê din vê bêdengiyê xira ne dikir.

Gola ko ew li ber rûniştî bû, ne ew qas kûr û mezin bû. Kûrahiya golê

sê-çar û firehiya wê şeş-heft û dirêjahiya wê jî bi qasê deh metreyan bû. Li

nav kevir û zinarên mezin mîna hewzekî xuya dikir. Parek ava golê ji

gundên jor bi riya rûbarekî piçûk dihat; para din jî ji binê golê ji nav zi-

naran derdiket. Li havînan ava rûbar kêr an zuha bibana jî, di golê de

17

## DARA GOZÊ

hertim av hebû û di ser re diherikî û ber bi jêr diçû. Havînan xortên gund

dihatin, diketin vê golê, lê bi şev kesek ne diwêrî riya xwe bi wan doran

bixe... Ji xwe sebebê şertgirtina gundiyan û Husên her ev tirs bû.

A di wê şeva tarî de, wexta Husên li ser golê bû, gundî jî li gund li

maleke fireh li hêviya wî bûn. Hinan digot: »Ne mimkun e Huso sax veg-  
ere, tirs û cinavir dê wî bikujin«, hinên dî digotin: »Welle cinavir-  
minavir  
tune ne, eger ew ne tirs e, dê sax û selamet vegere û du çewal  
genimê xwe  
qezenc bike... »  
Niha bala Husên li ser biraştina kewan bû; lê ji nişkê ve xumîniyek ji  
golê hat, te digot qey gol dikele; piştê bi dengekî nebihîstî û şiklekî  
nedîtî  
mînayî dêwek, tebayekî ji golê derket û ber bi agirî hat... Xwedê  
hîfza  
mirovî bike. Ev çî bobelat bû. Qasê sê metre bi dirêjahî, şiklek wekî  
mirovan û bi pirç, pirçeke dirêj ji pirça hirçan xirabtir, ser û çav jî  
mîna  
yê însanan, lê ew jî bi pirç bû. Eniya wî bobelatî ne dixuya; ser serê  
wî  
ecêbî mina bivirekî bû. Husên ji taqet ketibû, ne dikarî xwe bilivîne.  
Hewl dida ko rabe, biqîre, lê çî mixabin endamên laşê wî bi a wî ne  
dikir... Dêwê Enîbivir hat li hember Husên li kêleka agirî rûnişt. Li  
Husên mêze dikir. Piştî midetekê Husên bi ser xwe ve hat, dest û  
lingên  
wî êdî diliviyên. Dengê xwe ne kir. Nediwêrî deng bike. Ji kewên bi  
bez  
dilopên don diketin nav agir û dişewitîn. Husên bê hemdê xwe  
şivekî ba-  
da jibo hêla din ya kewê jî çêbe. Dêw jî wek wî kir. Her cara ko Husên  
şiv

badida Dêw jî bizariya wî fikir. Husên rahişt şivê û donê kewê di  
kincên  
xwe de da, Dêw jî rahişte şivek û teqlîdê Husên kir. Bi vî şeweyî ji  
serî ta  
ber lingan her du yan jî xwe di nava don de hiştin. Husên ji nişkê ve  
rahişte darekî bi pêt û di canê Dêwî da. Bi carekê laşê Dêwî agir girt  
û di  
nav pêtan de ma. Bi orînek mezin Dêw ber bi golê reviya û di nav  
avê de  
winda bû.  
Bi qêjîna Dêwî re ji tirsan Husên ji xwe çûbû. Gava şiyar bû êdî  
berban-  
ga sibehê bû. Li der û dora xwe mêze kir, agir tefiya û kewên wî  
şewitî  
bûn. Rabû ser xwe li golê fikir, bala xwe da der û dora agirî lê tiştêk  
nete-  
biî ne dixuya. Çû, ji golê av avête ser û çavên xwe, hat; devê tûr  
vekir;  
xwest ko hin nan û toraq bixwe, lê ne karî... li gel ko birçî bû jî. Rabû  
ser  
xwe tifing û tûrê xwe hilda û berê xwe da gund.  
Zerê li malê bi çavên bê xew li hêviya mêrê xwe bû. Ji çûyîna mêrê  
xwe  
heya sibê li malê bi tirs û kelecana xwe li quncikekê kişandibû ser hev  
û  
giriya bû... Bê ko haya wê jê hebe ko niha Husênê wê ber bi gund  
dihat.

Ji şefeqa xwedê ve li derveyê gund du xort li ser riya Husên li hêviya wî

18

bûn, da ko bi hev re herin mala ko gundî lê rûniştî bûn. Bi xuyabûna Husên re xort çûn pêşiya wî. Bi hev re meşiyar, bédeng. Xortan di bin ça-

van re mîna ko li lehengan tê temaşekirin li Husên mêze dikirin, Husên

li ber çavên wan wek dêwekî dixuya û bi heybet dimeşiya...

19

DARA GOZÊ

II - Bro û »dibistan«

Roja Înê bû. Ev sala yekemîn bû ko xaniyek li mehela jorîn bi lewheyekê

hatibû diyar kirin: »Dibistan«. Xaniyekî du ode bû, xwediye xanî mala

xwe biribû bajêr. Bi alikariya gundiyan, necarekî hin kursî û mase çêkirin, xanî sewandin û baş nayê bîra min lê ez dibê m qey duşemekê

gundî hemî li ber dibistanê civiyan, zarokên xwe jî bi xwe re anîbûn.

Yekê

serqot ko jê re digotin »Xoca« peyivî û paşê zarok çûn hundir û bavên

wan jî wegeriyan ser kar û xebata xwe.

Gava »memûr« ji bajêr hatin û gotin em dê didistanekê li gund vekin,

gundî piçekî tirsiyan; ji xwe li cem wan adet bû. Her tiştê ko ji derve,  
ji  
bajêr bihata tirsekê dixist dilê wan, bayê tirsê xwe li wan dipêça.  
Heta ji  
wan bihata xwe ji wan »xerîban« didan alî. Ji ziman û axftina wan  
tişteki  
fêm ne dikirin. Neheq jî ne bûn, hema bi vî halê xwe ez bi xwe jî acis  
dibûm. Çawa nebim, min bi xwe jî ji zimanê wan fêm ne dikir. Erê  
berê  
jî çend car hatibûn, lê hatin û çuyîna wan bala min zêde ne  
kişandibû; ji  
xwe li gund pirr ne diman; hêkerûna xwe dixwarin û diçûn. Ji ber ko  
min  
jî dizanî ew li vir namînin, ez ne zimanê wan fêrbûm û ne jî tişteki  
wisa  
fikirîm. Cil û bergên wan jî ne mîna yên gundiyan bûn. Tu rastiyê  
bêjî  
heta niha gundiyan tu xêreke ji wan »xerîban« ne dîbû. Carina yên  
bi çek  
-ji wan re esker digotin- dihatin gund hin xortê gund didan ser hev  
û  
dibirin; hinên din jî dihatin zêr û pere ji wan dixwestin; carina jî  
diketin  
malên gundiyan genim, ceh, nîsk çî bidestbixistana dibirin, digotin  
ji bo  
eskeran dibin...  
Îbrahîm zarokekî heft salî bû. Wî jî mîna hevalên xwe yên hemsalî  
dest

bi dibistanê kiribû. Xaniyê bavê Îbrahîm li mehela jêr bû. Gava  
Îbrahîm  
diçû dibistanê û dihat hertim di ber min re derbas dibû. Ji xwe berê  
ko  
dest bi dibistanê bike ez û ew em bû bûn dostên hev. Hûn dê niha  
bêjin  
ma çawa tu bi vî emrê xwe yê kal bi wî zarokê re bûyî dost? Baş e,  
ez jî ji  
we dipirsim ma kal û pîr çawa bi neviyên xwe re dibin dost? Şikir ji  
Xwedê re Îbrahîm wek we ne difikirî. Wî bêî ko zêde lê bifikire  
dostaniya  
min qebûl kir û hertim dihat cem min. Wî hema bêje ji çêbûna xwe  
heya  
20

îro bi çavên xwe yê hingivîn li min fedikir. Tu rojekê xirabiyek, êşek  
ji  
min ne dî. Gava piçûk bû, li nav qumatekê de bû, havînan diya wî  
ew li  
bin siya min dixist xew. Parastina wî ji tîrêjên rojê ji min re  
kêfxweşiyek  
bû; bi pelên xwe yê mezin, bi bilindahî û gurrbûna xwe bi saetan  
min  
ew diparast. Li min mêze dikir û min jî jê re çîrokên xweş digotin. Pê  
kêfxweş dibû û dikeniya. Eger hinan bidîta ko ew dikene digotin: »Bi  
melayîketan re dilîze û dikene.« Xem nake, melayîket jî ji min re ne  
xerîb  
in, piçek heqê min bi ser wan de diçe, lê...

Îro Bro, bavê wî û meleyê gund çûn li defîneyan bigerin. Mele  
niviştekekê nivisî û di nav kevnikekê de pêça. Li ser daxwaza bavê xwe  
Bro  
bê dilê xwe çû dîkê wan yê sipî bi destan girt, lingên dikî girêdan û  
ew  
xiste kîsekî fireh. Lê serê dîkê li derve bû. Bêr û kulingekê jî bi xwe re  
birin.  
Bi hev re ber bi çiyayê piştî gund meşiyên. Piştî nîv saetê li devereke  
ko  
lê hebûna xezîne şik dikirin, dîk ji kîs derxistin; nivişt bi benekî sist li  
stuyê dîkê girêdan; ji bo dîk nereve benekî dirêj jî avitine lingekê dîk  
û dîk  
ber dan. Mele digot: » Dîk li ko derê bang bide û nikilê xwe li erdê  
bixe,  
ew der divê bê kolan.« Lê dîkê li tu derî bang ne da. Bro dîkê xwe  
xist  
hembêza xwe û hilkişiyên. Du qatî ji cara ewil zêdetir meşiyên. Niha  
li  
serê çiya li herî jor bûn. Dihate gotin ko berê li serê wî çiyayî qesra  
mîrekî  
hebû ye; di erdhejanekê de xaniyê wî hilweşiyaye. Kesên di xanî de  
bûne  
mirine û xezîneya mîr jî li bin axê maye.  
Bro careke din dîkê xwe berda; piştî hin gerînê dîkê li du ciyan bang  
da  
û nikilê xwe li erdê xist. Cihê ko dîkê nikil lê dabû Bro bi qûçekê nîşan  
kir. Gava ev tişt qewimî Mele û bavê Bro li ser nimêja nîvro bûn.  
Piştî ko

nimêja xwe xilas kirin hatin û dest bi kolanê kirin. Qasê du metre  
kolan

bê ko rastê nîşanekê bên. Cihê duhemîn jî kolan ji bilî hin kevirên  
xirbê

tişteke ne dixuya ew jî herweha bê hêvî derket. Çend cihê din jî dîk  
berdan

lê bang ne da. Ber bi êvarê westiyayî û destvala ji çiya daketin, hatin  
malê.

Li nava gund Mele xatir ji bavê Bro xwest û çû mala xwe; Bro û bavê  
xwe jî ber bi mala xwe ve hatin; gava Bro nêzîkî li min kir, dilxweş  
bû û

bi dizî dikeniya dîkê xwe ji kîs derxist û ber da; dîk bi lez û bez ber  
bi malê

çû. Bro bi kêfa ko tişteki ne hate serê dîkê wî li kêleka bavê xwe bi  
gavên

xwe yê piçûk meşiya çû malê.

Aha wî dostê min ê piçûk dest bi dibistanê kiribû. Bi tirs û heyecan  
diçû. Ji rûyê wî kifş bû ko ji çûyîna dibistanê ne zêde razîbû. Rojekê  
min

meraq kir û jê pirsî:

— Bro tu çawa yî?

21

DARA GOZÊ

Bê dilê xwe got: Ez baş im, sipas.

— Tu dixwazî em hinekî ji xwe re bipeyîvin?

— Na, ne îro.



Min jî zêde ew acis ne kir. Bro meşiya çû malê. Lê mirûzê wî daketî  
û

bêkêf bû.

Piştî çend rojan, Bro hat cem min lê ne tenê bû. Çend hevalên wî  
yên

dibistanê jî pê re bûn. Hatin ji xwe re bi kap û gozan bilîzin. Îro ew  
kêfxweş bû; diqêriya, ew û hevalên wî bi hev re dikenyan, baz  
didan...

Min dixwest ez jê pirs bikim, ka dixwaze em bipeyîvin, lê min ji xwe  
re

got, dev jê berde, bi hevalên xwe re vaye dilîze; tu ê ji bo çi  
kêfxweşiya wan

biherimînî. Piştî listikê hevalên wî çûn malê, ew bi tena xwe ma. Li  
min

mêze kir û kenî. Mîna ko bêje, eger tu bixwazî em dikarin bipeyivin.

Min

got »de ka were.« Hat cem min rûnişt û dest pê kir: »Hevalê min yê  
hêja,

tu zanî ez ji te pirr hez dikim. Ji lewre jî tişteki ji te venaşêrim. Tu  
zanî îsal

min jî dest bi dibistanê kir. Ev midetek e ko ez diçim û têm; lê bi  
rastî kê-

fa min ji dibistanê re nayê. Xoceyê me bi zimanekî dipeyîve ko ez  
tişteki

jê fêm nakim. Ji ber ko zimanê wî û zimanê ko em dipeyivin ne  
wekhev

in, gava dixwazim tişteki bêjim jî, nikarim. Em yê ko me îsal dest bi

dibistanê kiriye hemî bi tirs û matmayî -wek kerr û lalan- li devê  
Xoce  
dinêrin. Min carekê ji diya xwe pirs kir, ka çima Xoceyê me yê  
dibistanê  
wekî me napeyîve, wê got »Xoce bi zimanê mektebê dipeyîve.« Go,  
»pêçekî bi sebir bibe tu yê jî fêr bibî.«  
"Tu zanî wê rojê dema ko te ji min pirsî çima ez pirr aciz û bêkêf  
bûm?  
Ez bêjim, ew hevalê kumspî ko gava din li vir bû, me dilîst; ew  
hevalekî  
min î jêhatî ye. Li nav gund di nav hemsalên xwe de yek ji wan  
zarokên  
herî jîr e. Çend roj berê Xoce jê re tiştêkî got. Wî jî ne dizanî çî bêje,  
ji ber  
vê yekê bêdeng ma. Vêca Xoce gelekî lê xist; ji êş û qehran hebû nîv  
saet  
giriya. Hevalekî min î din jî wê rojê, wexta me bi nok û hebê  
fasûleyan  
tiştên ko Xoce li ser textê nivîsîbû çêdikir, rebeno ne dizanî ji Xoce  
re bê-  
je »mîza min tê", xwe ne girt û li orta sinifê di bin xwe de mîz kir.  
De îca  
tu bêje ma tu bî, tu yê bê kêf nebî?«  
Ma min ê çî bigota, bi zimanekî din li dibistanê peyîvîn ji min re  
meqûl  
ne dixuya û herweha wek neheqiyekê bû. Lê min bi xwe jî ne dizanî  
çima

welê ye. Ji lewre min ne dizanî ka ez dê ji Bro re çî bêjim. Bro bi min baw-  
er bû; û ji xwe re digot: »Dostê min ê qedîm her tiştî dizane«; ji ber ko  
heya niha hertim bi dilekî germ û bi bersîvên têr min cewaba pirsên wî  
dabû. Ez niha ketibûm tengasiyeke mezin. Min his dikir ko nezanî bih-  
22

nê li mirovî teng dike; divê min bi awayekî xwe ji vê rewşê rizgar bikira.  
Li min bibexşinin, min jî xwe sparte riya kevnar, ango min got: »Bro piçekî sebir bike, gava tu mezin bibî tu ê bersîva pirsê xwe fêrbibî.«  
Bi  
nêrînên guhertî li min mêze kir; wekî bêje, »ma tu çima ji min re nabêjî,  
ka çima welê ye?«

23

## DARA GOZÊ

III - Bihar û eskerên reş

Li bin tîrêjên rojê, hilma ko ji erdê radibe bi bêhn û mizgîniya biharê da-  
girtî ye. Berf li quntara çiyayî ne maye, heliyaye. Li bilindahiyên çiyê li  
çalên kûr, cihên ko zivistanê ba û gijolekê berf dabû ser hev hîn spî dikin.

Lê cihên welê jî mîna pîne dixuyên. Piştî hefteyekê dê ew jî bihelin.  
Bi  
barana biharê re rûbarên ko ji çiyê dadikevin ji rengê axa sor û lîşo  
tije  
dibin; ji quntarên çiyê û qeraxên rûbaran her sala ko diçe axa li ser  
erdê  
zeîftir dibe û herweha çiya bi jiyana xwe ya dûr û dirêj nîşana vê  
yekê ye.  
Ji ber lehiyên biharê yekcaran welê lê dihê ko pez nikare ji rûbar  
derbas  
bibe; bi alîkariya gundiyan, bi zehmetiyeke mezin pez bi selametî  
dihê  
derbaskirin; li gel vê yekê jî carina bizin an mîhek li ber avê diçe.  
Dawiya meha Adarê û destpêka Nîsanê êdî bihar bi hemî xweşiya  
xwe,  
serî hildide û tebîetê diguhere. Tîrêjên rojê her roj germtir dibin. Ew  
çiyayê bi berfê pêçayî ewil cihê xwe ji pîneyên reşahî, ji kirasekî  
gewr û qe-  
hwehî re dihêle; piştî hêdî hêdî kirasekî kesk li xwe dike û roj bi roj  
kesk-  
tir dibe. Li qerajên çiyê pîrpizêk, pîvok, nêrgiz, binevş û beybûn  
mizgêniya biharê îlan dikin. Di destê wan de gulçanên wan, zarok li  
nav  
zewiyan, li quntara çiya pîvokan radikin; ji pîvokan tacên gilover  
çêdikin  
û wan tacan bi kulîlkên rengîn dixemilînin. Giya roj bi roj bilind dibe  
û

bi kulîlkên renga reng dihê xemilandin. Li biniya gund di nav  
bexçeyan

de spîndar ber bi asîman berzbûyî xwe ji biharê re hazir dikin. Li nav  
gund darên tuyan, tuyen şamî, spî û romî dibişkivin. Darên sêv,  
bîhok,

incas, qeysî û xox bi kulîlkên xwe yê rengîn bexçeyan, darên behîv  
û hir-

miyan li der û dora gund û li nav rezan; û paşê darên hinaran bi  
kulîlkên

xwe yê sorî kêfxweşî û bêhnfirehiyê peyda dikin û rengeke guhertî  
ko

mirovî mit û mat dihêlin didin biharê; vêca ev kulîlk di dema biharê  
de

dîmeneke bihuştî divejînin; tu dibê qey tebîetê di musabeqeya  
stêrkan de

ji bo bidestxistina xelata yekemîn; ji rengên kesk, sor, zer, spî,  
binevşî,

xemrî û pembe sentezek nedîtî afirandiye; û bi firçeya xwe ya tebiî  
ev dî-

mena li biharê vejîyayî çêkiriye.

Mêşên hingivî ji xewa zivistanê şiyarbûyî, bi keftelefteke mezin ji  
ke-

24

waran bi derdikevin, ber bi deryaya kulîlkan difirin; li ser kulîlkan  
reqs

dikin; doş dibin; datînin û bi îtînayek mezin cewhera kulîlkan  
hildidin û

ber bi xaniyên xwe ve difirin. Di kewaran de qesrên spî ava dikin;  
ew qes-  
rên ko bêhna mîmaran diçikînin û cih li wan teng dikin, bi sebreke  
mezin, kevir bi kevir tîn avakirin. Xebatkarên malê di bin serektiya  
Keybanû de ji dil û can dixebitin û embarên xanî bi cewhera kulîlkan  
dadigrin.  
Gundî li nav bexçeyan, rezan û zeviyan di kar û xebata xwe de ne.  
Her  
yek ji wan bi tiştê mijûl e. Hin ji wan rezan dişelînin (dikezixînin) û  
do-  
ra mêwên rezan dikolin. Hinên din mêwan dipêçin. Hin li nav  
bexçeyan  
cot dikin, dora bostanan bi striyan sênc dikin. Li nav bexçeyan  
birînên ji  
zivistanê mayî derman dikin.  
Çûk, kotel û kekû li ser daran, kew di nav kursan û bin tehtan de,  
şalûl  
li nav kendalan û bilbil di zikê zinaran de hêlînên xwe çêdikin. Ji  
berban-  
ga sibehê bigir heya ko tarî erd digire ji dengê çûkan, xwendina  
bilbilan  
ve hewa bi melodiyan tê dagirtin. Hela li pişt gund ber bi êvarê gava  
kew  
li ser zinaran dixwînin mirov heyran dimîne. Newal û rez di bin  
dengê  
kewan de melûl dibin. Vêca ez nizanim we qet guhdariya xwendina  
ke-

wan kiriye an na? Eger we ne kiribe çênabe, divê hûn biharekê riya  
xwe li  
van çiyayan bixînin û guh bidin wan. Wê gavê hûn dê min fêmbikin,  
ka  
di nav tebîetê bi xwe de van tiştê han jiyîn çi ye.  
Aha di biharek welê de, berbanga sibê me çavên xwe bi qêrîn û  
hewarê  
û bi reyîna kûçikan vekir; em şiyar bûn; lê dengê kûçik û teqîna  
sîlehan  
tevlîhev bû. Piştî demeke kurt deng ji kûçikan hat birrîn. Gundî yê  
ko  
fersend dîtî bi tirseke mezin ji malên xwe bi derketin û ber bi  
newalan,  
ber bi zinaran beziyan; li pişt keviran, zinaran xwe veşartin û li gund  
temaşê kirin. Yê bi çek hatî Eskerên Reş bûn. Li gundê me mêr  
kuştin,  
rehma wan li zarok û jinan jî ne hat. Tiştên nedîtî anîn serê jin û  
keçên  
me. Ez şerm dikim li vir qala wan tiştan bikim. Gelek jin û keç ji bo  
nekevin destê wan bêbavan xwe ji zinaran avêtin, kuştin...  
Wan bêbavan xaniyên gund şewitandin; pez û dewar birin; kesên  
ko ji  
destê Eskerên Reş xilas bûn bi çiyay ketin. Birçî, perîşan bi hefteyan  
li  
çiyay man. Ji bextê wan re bihar hatibû, êdî dinya germ dibû û  
pincar  
gelekî bû. Bi xêra wî pincarî ew ji mirinê xilas bûn. Li bin zinarên  
mezin,

li kûrahiya newalan û li şikeftan diman. Piştî çûyîna eskeran ji  
mintîqê ew  
vegeriyan gundê xwe. Lê gund ne mabû. Yê ko li jiyanê mabûn,  
wan ji  
nû ve gundê xwe ava kirin. Şikir ji Xwedê re vaye em bi hev re ne û  
car

25

## DARA GOZÊ

din li ser erdê xwe ne.

Bi rastî min ne dixwest bi bûyereke welê menzereya bihara herêma  
me

xira bikim. Lê ji destê min çi tê? Ez behs nekim, nabe. Herçiqas  
bûyerek

tehl û naxweş e û mirov naxwaze bi bîr jî bîne lê ev tişt qewimî ye;  
ji lewre

divê bête gotin. Eskerên Reş çima ew gund û gelek gundên din şewi-  
tandin sebeb çi bû, Eskerên Reş kî ne? Bi rastî ev serpehatiyeke  
gelekî

dirêj e!. Ji xwe wek min berê jî gotibû, ez li vir, li vî gundî bi cih im;  
qasî

ko ez li ser erdê xuya dibim ewqas jî li bin erdê me. Nikarim herim,  
biger-

im hertiştî fêrbibim. Ez tenê li gundê xwe û li der û dora xwe baş  
haydar

im. Ax ax, ji xêra Xwedê re li her deverê, li her gund û navçeyê jiyana  
kevin, nû û her tişt bihatana gotin û nivisîn da ko hemderdên min  
xuya-



bana û piçekî barê min sivik bibana.

26

IV - Evîn, xweşî û zilm

Îro jî Dîkê Mala Hecî Silêmanê Şaşikxwar hat di ber min re derbas  
bû, çû

nav zeviyên xwe. Hûn dê bêjin ev çi ye, ma bira ew dîk e, an tu welê  
dibêjî?

Belê, berê ko ez Dîk bidim nasîn, pêwist e ez ji Şaşikxwariya Hecî  
Silêman dest pê bikim. Li gund çend heciyên bi navê Silêman hebûn,  
gundiyan ji wan her yekê re navekî peyda kiribû. Vêca berî ko Hecî  
Silêman şaşikê xwar bide serê xwe, hertim bi rêk û pêk şaşika xwe  
girêdi-

da û bi usûleke xweş dida serê xwe. Lê rojek Çawîşê qereqolê li nava  
gund

digeriya û li ber dikana Ristem-ku gundî carina li wê derê kom  
dibûn-, ji

gundiyan re got »Nizanim ev bû çend sale ko Serok Komarê me yê  
nemir

înqîlabek çêkir û cil û berg guhertin. Ka bêjin hûn çima hê jî van şaşik  
û

kuman didin serê xwe? Rîha xwe mîna ya bizinan berdidin?» Hecî  
xwest

bêje ko li cem wan edet e, yê kal dibin şaşik an kum didin serê xwe,  
lê

hîn gotina Hecî bi dawî ne hatibû Çawîş şaşika Hecî ji serê wî kişand  
û

avête... Hecî deng ne kir. Şaşika xwe ji erdê hilda. Piştî ko Çawîş  
meşiya

çû, Hecî şaşika xwe cardin da serê xwe lê vê carê rast ne kir, şaşik li  
serê

Hecî bi hêla rastê xwar bû; loma jî gundiyan gava Hecî ne hazir bana  
jê

re Şaşikxwar digotin.

Sebro û Fatê ji can û dil ji hev hezkirin. Li gel ko Fatê jinebî bû jî,  
Sebro

guh ne da gundiyan û bi ya xwe kir. Berê ko bizewicin, gundiyan bi  
Sebro

yarî fikir, digot:

— Erê tu bi xwedê kî Sebro, ka bêje te çi di wê jinebiyê de diye, ko  
tu

welê aşiq bûyî, aqil di serê te de ne maye, hindik maye jibo  
qotejinek tu

bi çolan bikevî...

Sebro dikenî; destê xwe dibir ser serê xwe kumê xwe radikir û digot:

— A ji we re, vî kumê min carekê tenê bidin serê xwe û bi çavên min  
li

Fatê mêze bikin, wê çaxê hûn ê bibînin ka Fatê çawa ye? Bi Xwedê,  
bi

Xwedê ne li vî gundî ne jî li dereke din yeke mîna Fatê ne heye û ne jî  
çêdibe. Hema hîç xwe neêşînin. Fatê yekta ye, yekta.

Sebro xortekî sêwî û feqîr bû. Gava Sebro dehsalî bû, zivistanekê  
aşî li

27

DARA GOZÊ

ser mala wan de hat û xaniyê wan di bin berfê de ma, heta gundiyan ew

ji bin berfê derxistin dê û bavê wî çûn ser heqiya xwe. Gundiyan, Sebro

ji mirinê xilas kir. Sebro pêşîn çû ber golikan paşê jî şivanî kir. Piştî ko

mezin bû êdî di nav zeviyên xwe de kar dikir.

Rîsipiyên gund rojekê biryar girtin û gotin divê em Fatê ji Sebro re bixwazin û wan bizewicînin. Li gund herkesî bi gorî taqeta xwe alîkariya

Sebro kir û bi kêfxweşî û şahiyê daweta wan çêkirin û »evîndarên gund«

yên bi nav û deng gihandin hev.

Evîna Sebro û Fatê piştî zewacê jî kê m ne bû. Sebro ji jina xwe pîrr hez

dikir û hertim alîkariya wê dikir û ne dihişt Fatê karekî giran bike.

Eh, de

vêca hûn bêjin, li gund di rewşeke welê de ma gelo mirov ji devê gundiyan xilas dibe?

Yê mala Hecî Silimanê Şaşikxwar jî dîkek û çend mirîşkên wan hebûn.

Li der dora malê, li ser sergo gava ji xwe re li qût digeriyan wî dîkî eger

tişteki bidiya hema nikilê xwe li erdê dixist û dibû tix tixa wî, baskê xwe bi

erdê re dikişand; xwe dinepixand; gazî mirîşkan dikir; ew xwarin ne

dixwar dida mirîşkan. Ji ber vê yekê gundiyê ko bi jina xwe ve girêdayî û

miriyê jina xwe bana, gundiyan ev nav lê fikir: Dîkê Mala Hecî Silimanê

Şaşikxwar.

Gundiyan li bin siya min ji bo rûniştinê sekû çêkirine. Kalemêrên mehela nêzîkê min, dihên ji xwe re li ser sekûyan rûdinin û sohbet dikin.

Ji bilî kalemêran carina Mele Ehmed tevî feqiyên xwe dihat û li bin siya

min munaqêşe dikirin an jî xwendina xwe, dersên xwe li cem min dixwendin. Xwendina wan bi zimanekî biyanî, ango bi erebî û bi zimanê

gundê me bû. Fêrî erebî dibûn lê dersên xwe bi zimanê ez jê hez dikim û

fêm dikim şerh dikirin.

Digel kitêbên dînî wan kitêbên din jî dixwendin. Ji Meleyê Cizirî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî helbest dixwendin. Ji Xanî Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê û her cara ko bihatana beşekî ji Mem û Zînê dixwendin. Meraqê bi min jî girt, min digot: »Xwedêyo, Tu rêya wan bi

vir bixî ka bizanim çi bi serê evîndaran, Mem û Zînê hat.«

Di nav feqiyên mele de yek hebû navê wî Dilşad bû. Xortekî bejin dirêj

û çeleng bû. Dengê wî gelekî xweş bû. Gava bi wî dengê xwe yê xweş

Mem û Zîn dixwend kezeba mirov diheland. Carina ez kelegirî dibûm,

carina jî hêrs û heybetê min digirt... Lê roja ko Dilşadî beşê şeva zîfafê ya

Tajdîn û Stiyê xwend, ez bi asîman ketim; li erşê ala geriyam; firiyam.

Min ji can û dil dixwest ko ez jî di şûna wan bama. Min digot xwezî bi

28

wan evîndaran...

Dilşad ketibû nozdeh saliya xwe. Ev salek bû ko ne bi tenê bû. Bi Binevşa qîza Mele Ehmedî re zewicî bû. Xwendina xwe zûde xilas kiribû.

Eger ji bo meletiyê biçûyana gundekî din, dê û bavê wî bi tenê diman, lê

wî ne xwest ji wan veqete ji lewre Dilşad li cem wan ma. Li gund di nav

mirovên xwe de, li ser erd û rezên xwe dê baş xirab debara xwe bikirana.

Îsal rezên wan bi têr tirî bûn, hin mêwên tiriyê di bin giraniya guşeyan

de xwar bû bûn... Ber bi êvarê bû, germbûna tîrêjên rojê êdî şikayabû.

Binevş yek ji wan keçikên herî xweşik bû li gund. Wê û Dilşadî bi dilketinê ji hev hez kiribûn û zewicî bûn. Niha Dilşad û Binevş li nav rezê

xwe yê li biniya Zinarê Mêşhingivan digeriyan. Wî zinarî ji ko derê ev nav

girtiye û zinarek çawa ye? Belê, mîna tiştên din çîroka navê wî zinarî  
jî  
heye. Nebên ma çî, ser û binê wî ne xwe tev de zinarekî ye, lê ev  
yeka ne  
maqûl e; loma ez mecbûr im bêjim ko ew zinar ne zinarekî edeti ye.  
Teyrên ko dixwazin ji çavên neçê xwe û çêleyên xwe biparêzin, diçin  
di  
nîva wî zinarî de hêlîna xwe çêdikin. Zinarek, zinarekî berz. Tu deh  
xaniyên vî gundê me bidî ser hev bi qasî bilindahiya wî zinarî nabin.  
Ew  
zinar çawa li wê derê bi cih bûye û welê mîna ko hatibe çikandin, û  
bi wî  
awayî rabûye ser piyan Xwedê dizane. Havînekê wexta mêşên  
hingivî  
çêle didin; ji wan çêleyan komek ji gund derketin û dan dû rêbera  
xwe û  
çûn di nîva wî zinarî li quleke mîna e kewaran de bi cih bûn. Ji wê  
rojê vir  
de navê wî zinarî ma Zinarê Mêşhingivan.  
Li kêleka hev li nav rêzên mêwan geh winda dibûn; geh serê wan  
xuya  
dibû; bi meşînê re yekcaran kimaxên wan li hev diket û Dilşadî  
nermbû-  
na kimaxên Binevşê di canê xwe de his dikir. Carina bi lîênêrînek  
nerm û  
germ li hev dinêhêrîn û dimeşyan. Binevş li kesekekî axê likumî û li  
ser

dev û rû ket xwarê, lê ji ber nermbûna axa nav rez ew ne êşiya û bi ken

»ay« got, li bin kirasê wê yê havînî kimaxên wê diyar bûn; Dilşadî xwest

wê rake lê bê hemdê wî nêrînên wî çûn ser kimaxên wê. Di wê bêhnê de

gava Binevşê ji kêlekê û di bin çavan re li wî mêze kir, wê dît ko çawên wî

li gurmikên wê fedikin; bi niyeta xwe qulubandinê wê kimaxên xwe bi li-

vandineke nerm hinekî din rakirin; bi vê tevgera wê re gurmikên wê bêtir

diyar bûn; kirasê wê di nav qelîştoka kimaxên wê de piçek daketî bi cih

bû bû; wê xwe quluband û destê xwe dirêjî wî kir; bi dest kişandinek nerm wê mebesta xwe bi wî da famkirinê; li bin mêwên tiriye hev gevizandin... Bi gestin û maçên evînê deqên sorî di canê hev de mor kirin.

Geh li jêr û geh li jor cilên hev şelandin; li bin mêwên tiriye bi pelên

29  
DARA GOZÊ

mêwê pêçayîbûn; ew li bihuştê mîna ew du mirovên cara yekemîn bûn.

Di bin mêweke mezin ya tiriye reş de, bi dilên têrevîn li hev dinêrîn; wî

ji guşiyek tiriye reş çend heb jê kirin; -di nav lêvên wê de heb bi cih dikir

û bi ramîsanên sorgulî wan evîna xwe du par dikirin;- nêrînên wî  
çûn li  
ser çalika gerdena wê sekinîn; wî çend hebên din ji guşiyê jêkirin û  
li ser  
çalika gerdena wê givaştin; piştî çend heban kortik tije bû û dilopek  
ber  
bi jêr bi rê ket; navbera du çiyar re li newalê meşiya hat gihast  
navika wê,  
»Kaniya Qestelê”; li wê derê ji bêtaqetî serî danî. Dilşad jî bi nêrînên  
xwe  
bi dilopê re dimeşiya; ew jî hat li ser »Kaniya Qestelê« sekinî; serê  
xwe ber  
bi kaniyê xwar kir; bi ziman û lêvên xwe yên tî ava kaniyê ya reng  
şerabî  
zuha kir û rêça peyayê berê ber bi jor ajot; Binevş li bin wî, bi çavên  
xwe  
yên nîv vekirî yên karexezalî difiriya; pêlên evîne di bin zimanê wî  
de mî-  
na lehiyek Binevş dihejand; Dilşad gihaste çalika gerdenê û ew ava  
reng  
meyî miçikand.  
Gava deriyê bihuştê bi kêfxweşî li pêşiya wî bi awayeke daxwazkar  
nîşana xwevekirinê da, siwarî bê teredut kete hundir; li buhuştê ew  
yek-  
car li hev sor bûn; can û giyan bûn yek, ji hev dûr ketin; cardin bûn  
yek,  
cardin... xwe li ser pêlên deryayê di keştiyeke xewnî de didîtin; gava  
keştî



ji ber pêlên deryayê ji neçarî û bê mecalî gihaye kerax û lenger avêt  
bin  
behrê êdî rêwî mest bû bûn... Midetekî li bin mêwê li tîrêjên rojê  
yên ko  
ji rojava li nav pelan diherikîn û rengê sorî dida nav rez temaşe  
kirin; roj  
li ber daketinê bû; ji dûr mina lengeriyêke agirî dixuya. Avakar ji  
rindî û  
hezkirina wan kêfxweş li asîmanê heftan dikenî.  
Payîz wexta çînîna tirî û ser rezan bû. Ev deh roj bû ko Dilşad û  
Binevş  
bi rezan ve mijûl dibûn. Wê salê tirî baş bû, du lîn (sîtil) kirin bastêx,  
yek  
divs û yek jî divsê tîr çêkirin. Lînek jî kirin kesme û lepik. Beranên ji  
darê  
dirikan, şivên behîvan, bîhok û hirmî li esîdî xistin û lepik ji bo  
hişkirinê  
dan ber tavê. Nîvlînek esîd ji bo beniyên sor çêkirin, beniyê ji  
kankilê  
gozan di esîdê re dikirin piştê ko bihneke xwe digirt careke dî  
dixistin nav  
esîdê bi vî şeweyî sê çar car tekrar dikirin heta beniyên baş xwe  
digirt û bi  
goşt dibûn. Nîvlînek şîre jî ji bo beniyên spî anîn malê. Roja dî çend  
nas  
û dost hatin malê ji bo çêkirina çalme. Ji bo çalme, ji darê belelûkan  
şivên

dirêj bi qasê metreyek jêdikirin û diteraştin; serê şivan bi şax dihîştin.

Çend şiv didan ber hev û baş girêdidan. Esîd çêdikirin û ji bo rengê esêdê

vekirî be hinek dew dixistin nav şîreyê, piştî ko esîd dikelî, esîd bera teştekekê didan û berê ko sar bibe, sê çar kesan bi wan şivên çêkirî bi hev re

li esîdê didan heya ko esîdê rengê xwe diguhert û spî dibû. Piştê ko rengê

30

esîdê hat guhertin û spî bû, bi vê yekê re him tîr dibû him jî bi kef.

Ji vir

pê ve mîna yê beniyên sor beniyên li esîdê dixin û didin ber tavê da ko

zuha bibin.

Li gundê me bi rehetiya bi dawîanîna karên xwe yê rojê bi awayekî westiyayî piştî nimêja eşayê pîrraniya gundiyan dinivin. Vê carê jî welê

kirin. Bûmekî hat û li ser dara tuyê venişt. Bi çavên xwe yê beloq li tariya

şevê fedikir.

Ev berbang wek berbangên din bi xweşî li ser wan ronî ne bû. Bi xwe re

esker û cendirmeyên kinc kesk anî. Beriya şefeqê bi du saetan hatin gund

û li dora wî bi cih bûn. Bi şefeqê re gazî Mixtar kirin û jê re gotin bila,

Bekçî gazî hemî gundiyan bike û ji wan re bêje emrê qumandar e,  
bila

hemî li ber qereqolê kom bibin.

Qereqol li hêla rojhelat li qeraxa gund di xaniyekî yek tebeqe de bû,  
ew

jî li quntarê çiya bû, li kêleka milê rast yê xaniyê qereqolê kaşekî  
vala bi

strî û kevirên bîrçok hebû. Ji ber nêzîkî qereqolê bû gundî zêde ber  
bi wî

ve ne diçûn.

Sebro û Fatê ji êvarê de li ber mengenê rûniştî demetên titûn ji bo  
hûrkinê hazir dikirin. Dê sibeyê Sebro biçûyana bajêr. Ji Fatê re  
digot:

»Hîn piyasa titûnê venebûye, eger ez niha titûnê bibim bajêr û  
bifroşim,

dê pereyekî baş bikeve destê min.« Titûn pel bi pel paqij dikirin, ji  
pelan

damar dikişandin û li ser hev demet dikirin. Bi qasî bîst demetan  
titûn

paqij kirin. Sebro carê çar demet di zikê mengenê de bi cîh dikir. Bi  
rastî

karê bi titûnê ve û mengene kirina titûnê çîrokekê dirêj e. De ka bila  
titû-

na qutiya dikandarê Sûka Şewitî ji we ra çîroka xwe bêje:

”Tovê min li biharê li ser axeke bi zibil tê reşandin. Piştî ko wek şitil  
ez

mezin dibim, vêca min ji rehên min ve dikşînin û dibin li nav zevî an

bostanan datînin. Piştî çend efar û avdanan lemên min bilind dibin.  
Ji  
hêla binî ve gava pelên min bi deqên zer tên nexşîn êdî wext e ko  
wan  
pelan jêkin û bibin malê. Min dibin yek an du rojan ji bo ez baş zer  
bibim  
dixin xweydanê. Paşê min bi ben an şerîtan ve dikan û didin ber tavê  
ji bo  
hêşkbûnê. Piştî ko ez hişk dibim min li ciheke bi nem datînin û di  
dem-  
sala payîzê de ez tîm paqijkirin û bi rengên xwe yê guhertî ve tîm  
dabeş  
kirin. Ê niha jî ez li bin kêra Sebro li ber mengenekirinê me. Eger yê  
mengene dike yekî jîr be, ez dibim mîna porê keçên kej, dirêj û reng  
zer.  
Min gelek caran bihistiye, ko hinan gotiye »Mirov dil dike vê titûnê  
bixwe.« Eger li ser riya bajêr ez ji destê cendirman û li bajêr jî ji  
destê  
»qolçiyar« xilas bibim li Sûka Şewitî tîm firotin. Vêca dikandarê  
kiryar

31

DARA GOZÊ

qutiya xwe ji berîka xwe derdixe û tu dibê qey wî bi xwe ez  
afirandime,  
dirêjî dostên xwe dike...«  
Gundî ne bi dengê mele ne jî bi dengên dîkan şiyar bûn wê sibehê,

Bekçiyê gund li ser baniyan digeriya û bi dengê xwe yê li xewê  
fermana  
qumandar ji gund re eşkere dikir. Gundiyeên ko serê sibehê zû diçûn  
ser  
karê xwe li nav zeviyan û yê ko hayiya wan ji fermanê tune bû an  
jî  
dixwest xwe li derveyê gund veşêrin, ji alî eskerên ko li kemînan li  
dora  
gund bûn hatin girtin; bi xweşî an zorê tevî mêr û xort yê li gund,  
li ber  
qereqolê kom bûn.  
Sebro tevî du cendirmeyan û li ser milê wî mengene û li piştê wî çe-  
walek titûn ber bi meydana dihat. Cendirmeyan ew rasterast bir  
cem  
qumandarê xwe. Qumandar bi şiva destê xwe mengene nîşan da û  
ji  
Sebro pirsî ka »ew çi ye.« Sebro got »ev mengeneya titûn hûrkinê  
ye.« Li  
ber qereqolê li pêş çavên hemiyan bi Sebro hin titûn dan hûrkinê.  
Piştî  
ko dîtî rast e, vêca cendirman Sebro bi defdanan bir nav gundiyeên  
din.  
Qumandar hat û li pêş gundiyan sekinî û bi dengê tehdîtkar got:  
»Hinan ji we îşev mala Çawîş gulebaran kiriye. Ka bêjin kî ye? An na  
ez ê  
welê bikim ko hûn dê poşman bibin ko hûn ji diya xwe bûne.« Ji  
gundiyan tu deng derneket. Temamê gundiyan mîna şagirtên  
didistanê

ketibûn rêzê. Qumandar çovek di dest de li pêşiya wan diçû dihat.  
Bêdengiya gundiyan ew yekcar hêrs dikir. Bi çovê destê xwe li bin  
çena  
wan dixist bi wî şêweyî serê wan radikir û pirsaxwe tekrar dikir.  
Gundî  
bêdeng bûn. Qumandar emir da eskerên xwe ko çovên baş ji xwe  
re pey-  
da bikin û »van ker kurrê keran« bîstek »talîm« bikin. Cendirme û  
esker-  
an ji hewşên nêzîk mirdyaq anîn. Bi emrê marş! ve berê gundiyan  
dan wî  
kaşaxwe bi strî û kevîran, gundî dibezîyan û eskeran jî ji par ve li nav ser,  
mil,  
pişt ne digot li wan didan. Dilşad û çend kesên din ko xwestin tiştin  
bêjin  
û li dij vê zordestiyê derkevin, ji hemîyan bêtir lêdan xwarin.  
Eskeran carê  
rêzek gundî didan ber xwe û ew »talîm« dikirin. Gava hin esker di-  
westîyan hinên din cihê wan digirt. Ji serê sibê heya bi nimêja nîvro  
li  
gundê me li ber qereqola gund, gundiye ko lêdan nexwar ne ma.  
Gava es-  
keran terka gund kir, bêdengiyeke giran û bi êş û nefret xwe li gund  
pêça.  
Dilşad jî tê de gelek kes bi rojan, hin jî bi hefteyan li nav nivînan  
man...

V - Epîlog, Dara gozê

Ez hîn li vir im; li gundê xwe li ser axa xwe me; bi rehên xwe ve li bin kûrahiya axa gund rêç dayî me; li ser erdê, bi hêz û heybet im. Bi berên

xwe, kankilên xwe xweşiya kêfa zarokan im. Bi hemî êş, jan, xweşi û

nexweşiyên xwe ve li vir im. Bi emir im, kal bû me. Ji dostên min yên vî

gundî gelek kes çûn ser heqiya xwe. Zarokên wan, neviyên wan, neviyên

zarokên wan hatin û çûn; zordestî li wan hate kirin; birçî man; pêlên zilmê li wan rabûn; agir û tofanan xwe li xaniyên wan pêçan... Bi çiya

ketin li şikeftan, li gelî û newalên kûr man.

Bi destên hev girtin hatin; cardin li kêleka min rûniştin; bi kul û keder

ji dil axîn kişandin... Xaniyên xwe nizanîm cara çendan ji nû ve avakirin.

Bi destên xwe yên terizî kevir li ser kevir jiyanekê nû danîn; tovên jiyanekê nû çandin...

33

DARA GOZÊ

Çiyayê Zêrkan

Çiyayê Zêrkan çiyayekî bilind û bi darên mazî û hewrsan xemilandî ye.

Li der û dora xwe bi bilindbûna xwe ve bi xof e. Newal û dolên dorûdor

hemî di bin heybeta wî de ne; û di demên geşbûn û kêfê de berê  
xwe  
didin wî. Zelaliya berbangên sibehan ji qotikên wî dertên. Roj bi  
tîrêjên  
xwe yên bi şewq û zer li qotikin wî diteqe, germahî û jiyânê ji wê  
derê li  
gelî û newalan direşîne.  
Gundên cîran, şênîyên wan, di demsalên bi baran û berf de, li wî  
mêze  
dikin. Ew, ji bo wan mîna nîşana rewşa dinyayê ye. Gava serê çiyê  
bi mij  
û dûman e, dizanên ko êdî şilî nêzîk e. Berf û baran li rê ye. Serma  
û se-  
qem dê mideteke din xwe bigehîne warê wan jî.  
Birûskên asîmanqelêş di zikê wî de deng didin. Gurmîn û xumîna  
dengên wan birûskan teyr û tilûran, gur û hirçan, rovî û kerguhan  
bi  
hebûn û hêza xwe dide hesandin. Di nav zinar û qelîştokên çiyê de  
her  
cûre heywan ji xwe re mekanekî peyda dike, ji lewre di şevên tarî  
de, dibe  
warê koviyan; ew dil germ e, bi dil germiya xwe ji her babet jiyânê  
re  
hembêzvekirî ye.  
Ava çeman, ava kanî û golan ji zikê wî dertê. Zivistanê, ew, li dema  
şiliyê dilê xwe bi berf û baranê paqij dike û ji nû ve dadigre. Bi hêz  
û hey-



beta xwe bi gurmîn û şeqînê, bi rehên xwe, ava wek seqemê li der  
û dor

belav dike.

Tê gotin ko şivanekî di dawiya biharekê de gava li ber pez bû, rastî  
avzêmekê hat; bîstekê ax da alî, di bin kevir û qelîştokan de xumînî  
ji avê

dihat; şivên meraq kir û bilûra xwe avête nav avê, bilûra şivan, piştî  
çend

rojan xeber gihîşt gundê wî ko li gundekî din di kaniyekê de  
derketiye. Lê

hin jî dibêjin şênîyên gundê quntara çiyê, avzêmek hema bêje di  
nîva

bilindahiya çiyê de dîtin û dest pê kirin û kolan, piştî ko di nav  
zinaran re

guh li xumîniya avê kirin, anîn xirarek ka bera nav qelîştokan dan,  
mer-

aq dikirin ka dê kaya wan li ko derbê. Paşê pê hesiyan. Kaya wan li  
gelek

gundên nêz û dûr, ji avzê û kaniyan derket. Lê paşê, bi  
herikandina axê

re devê qelîştokan hat girtin; û ew roj ev roj nema kes cihê wê  
avzêmekê, ya

34

li çiyayê Zêrkan, dikare bibîne...

Bi çîrok û nehîniyên xwe ve çiyayekî navdayî ye. Tirsê dilê zarokan,  
xweşî û germiya çîrokên zivistanê yên şevên dirêj e, cih û warê  
mehkûm

û fîraran e. Stara evîndaran, dilketiyan û veşartoka keç û xortên dil  
lerzok

e. Çiyayekî dil bi rehm e.

35

DARA GOZÊ

Çîrokên Çiyayê Zêrkan

1 - Bajarê qedîm

Derengê şevê di şikefteke piçûk de, li çiyayê Zêrkan ez di xew re çû  
bûm,

xewn û xeyal, ji şikefta ko di navsera çiyê de bû, min hêla rojhilat  
xweş

didît. Geh bi wan re, geh ji dûr mîna ko dûrbîneke baş li ber çavên  
min

be, hertişt pirr xweş û zelal xuya dibû:

Zivistan ber bi dawiyê ve diçû û bêhna biharê êdî dihate mirovî.

Hingura sibê bû. Li geliyê Zêrkan peyayên xweşmêr û mêrxas di  
tevdîreke giran de bûn. Ew dê ber bi bajarekî mezin biçûyana. Şev  
bû,

tarî bû. Di tûrên -serê hespên- wan de ceh û alif... Li qonaxeke  
mezin

serokeşîr û giregirên wan di xewneke sivik de raketîbûn. Li ber  
deriyê

qonaxê esker di nobedariyê de bûn. Beriya berbangê rabûn, xwe  
hazir

kirin. Piştî limêj û taştê, li ber qonaxa giran civiyan. Bi qisekirin,

kustepist, bi coş û heyecan bûn. Piştî midetekê Rîspiyekek ji qesrê  
derket.

Li cihekî bilind sekinî. Li der û dora wî mirovên qedir bilind hebûn.  
Hêdî hêdî li dora xwe mêze kir. Bi şêweyeke nerm dest bi axaftina  
xwe  
kir, her ko diçû dengê wî xurttir û bilindtir dibû. Axaftina xwe,  
»Xwedê  
bi me re ye« bi dawî anî, bi peyiva »amîn« xilas kir. Hemiyan bi hev  
re  
»amîn« gotin...  
Siwar li pêş, li pey wan peya ketin rê. Hespên li bin siwaran di  
heyecan  
û keftelefa bezînê de bûn. Ber bi bajarê qedîm, bajarê hêviyê,  
bajarê dilê  
welatê xwe bi rê ketin.  
Berbanga sibê bû,  
diherikîn,  
pêl bi pêl di geliyê Zêrkan re diherikîn...  
Dinya sar bû. Roj li ber hilavêtinê bû. Qotikên çiyê tîrêjên rojê ji dûr  
di-  
reşandin. Eskerên Rîspî bi kincên xwe yên sipî, bi şal û şapikên xwe,  
bi  
şaşikên xwe, bi kolosên xwe ve parçeyekî wan çiya û newalan bûn.  
Hin bi  
çek bûn. Modelî û eyneliyên wan li milê wan û xencerên wan li ser  
zikê  
36

wan, li ber wan bûn. Yê bê modelî bi xencer bûn, bi çov bûn, bi kêr

bûn... Di tûrê hinan de nanê tenûrê, ew diçûn, ber bi bajarê qedîm  
di-  
herikîn.  
dî sibe bû. Li ber dil û çavên wan siwar û peyayan, wê sibehê roj sed  
qat  
ronahîtir û germtir li topika çiyayê Zêrkan bilind dibû. Dikeniya.  
Modelî û eyneliyên çekdaran di şewqa xwe de dibiriqand. Xencerên  
wan  
diçûrisîn... dî dunya germ dibû. Pêla germbûnê xwe li eskerên Rîspî  
pêçabû. Bi dilekî germ û têrcoş li hespên xwe siwar, di nav  
qedirbilindên  
civata xwe de ber bi bajarê qedîm diherikîn...  
Her ko diçû hejmara wan zêde dibû. Ji gundên derûdor xelk tevî  
wan  
dibû. Piştî demekê êdî gihastibûn qeraxên bajarê qedîm. Bajar bi  
beden  
û bircan pêçayî bû, beden li ber tevgera wan ber bi asîman bilind  
dibû.  
Zû bi zû rê ne dida kesî ko têkevin nav dilê wî. Gelek bûyer bi serê  
wî de  
qewimî bûn. Bajarê kevin li ser bejna deşta fireh, bi dîmen û  
dilxweşiya  
xwe, bi ezamet û heybeta xwe, li ber seqem û bayê, di bin perê  
çiyayekî,  
li perê çemekî, mîna bûkeke xemilandî li hêviya xwazgîniyê xwe bû.  
Bi  
şik bû, bi heyecan bû... Lê gava çiyayî hatin û li der û dora wî civiyan  
dilê

wî germ bû, ji german hema bêje dikir bikeliya. Wî dizanî, yên ko hatine

ji dil û can, ji kezebê, ji evîna dil ji wî hez dikin.

Wan dixwest wî hembêz bikin, dil û mejiyê wî paqij bikin, wî di nav evînê de gêj bikin, sermest bikin, jê re govend û dîlanan bi darxinin, kuçe

û kolanên wî bibiriqînin, bircên wî bixemilînin, kemerek zêrîn li piştta wî

girêdin, ji gulên sor, zer û spî bi fetlokên kesk tacekê çêkin; bi rûmet û

qedirbilindî bi destê Rîspî, wê tacê bi coş û şahî, deynên ser serê wî û wî

pîroz bikin...

Li ber bircên bajarê qedîm demeke dirêj man. Şer kirin, ketin nava ba-

jêr, di dilê bajarî de dest bi xencer êriş birin... Lê bajarê qedîm ne hazir bû

ko xwediye xwe, evîndarên xwe hembêz bike. Ew di bin giraniya çekên

neyaran de ustîxwar bû, neçar bû... Xwazgîniyên wî bi dilekî xemgîn vek-

işyan. Bê dilê xwe ji bajarê qedîm, bajarê dilê çiyayîyan, bajarê paye

bilind, bajarê bi keleh û birc, bajarê bi minareya çar ling, bajarê çar derî,

bajarê bi tolaz û pêxwasên xwe ve bi navûdeng li pey xwe hîştin û ji bo de-

mekê jê xatir xwestin!

Berbanga sibehê di wê şikefta piçûk de li çiyayê Zêrkan, yê ko wê sibehê

bi mij hatibû pêçan, ez bi tevezînokên sermayê ji xewê şiyar bûm.

Rabûm

ser xwe, çûm ber deriyê şikeftê min li dûr mêze kir, lê ji mijê tişteki xuya

ne dikir!

37

DARA GOZÊ

2 - Şêrko

Şêrko xortekî çardeh salî, ji gundekî bakûrê bajarê qedîm û çiyayî bû.

Mirovên wan li bajarê qedîm hebûn; ew li mala wan dima û diçû dibis-

tanê. Hemsalê wî Xelef, kurê malê, bi Şêrko re wek bira bû.

Şêrko tevî bavê xwe hefteyek bû ko hatibû bajêr. Şêrko tevî hemsalê

xwe ev çend roj bûn, hertim diçûn ser banê xaniyekî -ku nêzî meydana

fireh bû- li meydana sêdaran dinêrîn.

Sêdar,

ew darên mirinê,

bi kindir, zirav û berz.

Sêdar,

li erdê dagirkirî,

bi destên bêbextan rastkirî.

Sêdar,

mengenyên mirina sar,  
mirina xof û dijwar.  
Sêdar,  
kujarê azadiyê.  
Sêdar,  
sebebê rondikên zelal.  
Sêdar,  
ezraîlê bi destê insanan çêkirî.  
Dinya germ bû, demsala havînê bû. Li meydana sêdaran esker diçûn  
û  
dihatin, li kêleka hev gelek sêdar hatibûn rêz kirin. Li jora her  
sêdarekê  
kindirek hatibû girêdan, xeleqeyek li nava her sêdaran ber bi jêr  
daketî  
bû. Neçar bû...  
Ev roja heftan bû ko her roj qefleyek çiyayî dihatine xeniqandin.  
Gava  
Şêrko ew kesên ko cil û bergên wan yên wek gundiyên wî bûn  
didîtin,  
dilê wî dişewitî, xem û keserê xwe li wî dipêça, ew diêşand.  
Rondikên

38

çavên Şêrko û Xelefî zuha bûbûn. Dilê wan bi êş lê dida. Ji kerb û  
hêrsan,  
bi mad nexweşî, ew ruyên bê guneh û pak hatibûn guhertin û cihê  
xwe ji

êş û derdan re hîştibû... Di wan çend rojan de zaroktiya xwe ji bîr  
kirin,  
te digot qey nema zarok in; awir, meş, xeberdan, rabûn û rûniştina  
wan,  
her tiştê wan, hatibû guhertin.  
Şêrko piştî çend rojan tevî bavê xwe ji bajêr bi derket û berê xwe  
dan  
gundê xwe li hêla bakûrê bajarê qedîm, ber bi çiyên meşiyên...

39

## DARA GOZÊ

### 3 - Pîra Esmâ

Di piçûkiya xwe de Sosinê jî wek hemî zarokan ji çîrokan gelekî hez  
dikir,  
ji lewre ew çîrokên dêw, dirinde, cin, perî, pîrebok, mêrên şevê û  
gelekên  
din wiha di mejiyê wê de bi cih bûne ko ew dike nake ji wan xilas  
nabe.  
Herçiqas hin texlîtên tirsê di salên wê yên kamil de jî li tirsên wî zêde  
bûn  
jî, lê yên zaroktiya wê hertim xewa şevan li wê diherimînin û pirê  
caran  
wê di nav xwîdaneke sar de dihêlin. Bîranîn û serpêhatiyên tirsê  
tenê para  
wê ne bûn; herweha tê bîra wê ko di zaroktiya wî de pîra wê jî behsa  
tirs  
û xewnên tirsê dikir.



Derengê şevê berî berbangê, gava pîra Esmâ ji xew bi tirs û lertz şiyar bû,

diricifî. Li dora xwe mêze kir, bêhna xwe stand, maxên xênî, dîwar, derzîdank, Quran û hemalî, tifika agir, li kêleka tifikê pisîng bi nirenirê,

hertişt wek hergavî li cihê xwe bû. Pîra Esmâ ji xwe re got şikir, hezar şikir

ji Xwedê re ko xewn bû...

Ew jî bi selawat û duayên pîra xwe, Esmayê, ji xew şiyar bû, wê jê pirsî ka

çi bûye? Pîra wî got »derengê şevê ye, niha razê ez ê serê sibê ji te re bêjim.«

Pîra wî Esmâ jiyaneke dirêj jiya bû. Wê gelek zehmetî dîtibû. Carina behsa serpêhatiyên xwe, malbata xwe, gundê xwe dikir. Lê ya herî giran

û ya ko di gava behskirinê de jî pê diêşiya dema xelayê bû. Her di wê wex-

tê de nexweşiya taûn ketibû nav wan; û li gund, her roj çend meyt radikirin.

Serê sibê Sosinê ji Pîra Esmâ pirsî ka ew çi xewn bû ko ew ewqas bi tirs

şiyar bû, Pîra Esmâ xewna jêrîn ji wî re behs kir:

»Di tariya şevê de qêrîn û hewar kete nav gund. Dengê jin, mêr, kal, pîr

û xortan tevlîhev bû.

— Ji rojava hatin, bi tîr û kevan in!

— Agir dibarînin.

— Tîrên wan şivên agir in...

- Xwedê hîfza mirov bike...
- Bîsmîlahîrehmanîrehîm... keçê diayan bixwînin...
- Gazî ewliyan bikin...

...

- Ha vaye, direvin. Ber bi rojava direvin.
- Mezinên me, ewliyayan li wan xist...

Komikên mirovan li hev civiyan, dest bi axaftinê kirin. Gotin efrît in, efrîtên mirinê ne, yên ko avêtin ser gund. Bi xêra gorbuhîştan, bi xêra

ewliyayan, gundî tenê bi du miriyan vê carê ji destê jana mirinê xilas bûn...«

41

## DARA GOZÊ

### 4 - Newala cinan

Ez ji beriyê dihatim û ber bi çiya diçûm. Piştî nimêja esirê min xatir ji

mazûbanê xwe xwest û ez bi rê ketim. Ber êvarê ez gîhaştim biniya gundê

Birkan, çend malên ko nêzîkî rê bûn, li ser banên wan, gundî diçûn û di-

hatin. Gava wan ez dîtîm, gazî min kirin:

— Ho xortoo!

Li ser pişta hespê xwe di nav ramanên ber bi malê ko min dixwest gavekê zûtir herim; ji ber bangkirinê ez sekinîm, min serê hespê xwe zivi-

rand, berê xwe da hêla ko deng dihat û min hespê xwe ber bi wan ve ajot.

Min silav da wan. Silava min hildan û gotin:

— Keremke em derbasî hundir bibin. Îşev li cem me bimîne. Min sipasî wan kir û got:

— Ez dixwazim gaveke zûtir herim.

Kirin ne kirin min got na ez ê herim. Gotin:

— Heyran bi rastî em naxwazin tu niha bi tena serê xwe herî, piştî vî

girê hanê ko li ser riya te ye, geliyê cinan heye. Kesek nikare bi şev tê re

bibihure. Tirs heye, cinawir hene, gelek mêrxas bêhiş ketine...

Ez ê xort, bi xwe bawer, xencera min li ber min, li milê min modelî, hespê min li bin min, duxan ji serê min radibû. Kirin ne kirin, min got:

— Ez nikarim bisekinim. Li gundê Mendan ez ê bibim mêvanê dostekî

xwe. Min xatir ji wan xwest û berê hespê xwe zivirand ser riya xwe. Ber êvarê dunya hêdî hêdî tarî dibû. Destpêka payîzê, germiya havînê

êdî şikestibû. Wexta ez gehîştim gelî, edî wî kirasê şevê li xwe kiribû.

Ez,

berê bi roj di wî geliyê re derbas bû bûm, ji lewre derûdor ji min re ne

xerîb bû. Bi ajotineke nerm gelî saetek wext digirt. Herçiqas ez bi xwe

bawer bûm û min ji xwe re digot ez natirsim, lê piştî nêzîkbûyîna min li

gelî, ew tiştên ko gundiyan ji min re behs kiribûn di dilê min de weswe-

seyek peyda dikir. Min hespê xwe bi diqet diajot. Lê wesweseya dilê min

di mejiyê min de bê hemdê min serpêhatiyek vejand:

Heçî wexta ez zarok bûm, li gund şevên zivistanê yên dirêj bê çîrokan

ne diborîn. Eger me zarokan keysek bi dest bixistana û xwe bigîhandana

42

mala ko yek ji çîrokbêjên gund lê mêvan bû, wê şevê kêf kêfa me bû. Me

li ber dîwêr an jî li quncikekê ji xwe re cihekî peyda dikir û em bê sebir li

hêviya çîrokan diman. Çîrokên pelewanan, padîşahan, pismîr û dotmîran, dêwan, pîrebokan, çîrokên li ser dirindeyan û gelekên din...

Carina çîrokbêj bi xwe dest pê dikir çîrok digot, carina jî daxwaza guh-

darên bi cih dianî. Di navbir an bêhnvedana çîrokbêj de, ji qatix an fikiyên hişkirî, piçek para me jî diket. Me bi dilxweşî dixwar... Heçî

şeva

ko çîrokên tirsê, an dirindeyan bihatana gotin, tirs dikete dilê me, em bê

dilê xwe radibûn û me bi tirs û lertz berê xwe dida malê.

Gava li malê jî pîra min ji me re çîrokina li ser dirindeyan digotin, û bi

taybetî yên behsa guran nava me diqetand. Şevên zivistanê yek  
caran ez  
ne diwêrîm ji malê derkevîm, li derve bimîzim, heta ji min dihat min  
xwe  
digirt, lê çare tune bû, gava ez diçûm derve jî, bi tirs û lerz min mîz  
dikir,  
di vegeerê de ez ditirsiyam û berê ko min xwe biavêtana hundir, min  
ji xwe  
re digot, wextî gurekî bi min bigire. Gurên har.  
Digotin: 'Rojekê zilamekî jêhatî, di şeveke zivistanê de ko berf datê,  
dinya sar e, dibêje ez dê herim, mala xwezûrê xwe. Mirovên wî jê  
re  
dibêjin, heyran zivistan e, berf e, sar e, dirinde hene, gur hene,  
birçîne, di-  
avêjin ser gundan, li heywanan dixin; kirin ne kirin, zilam dibêje îla  
ez dê  
herim. Dêbêje, vaye hespê min heye, şûrê min li ber min, xencera  
min bi  
min re, tifyinga min bi min re ez ê ji çî bitirsim. Radibe, êvarê dereng  
ji  
gund derdikeve û berê xwe dide gundê xwezûrê xwe. Piştî riya du  
saetan,  
ko her berf datê, li newalekê dibe zûrîna guran. Zilam dilezîne, lê ji  
ber  
berfê hespê wî nikare pirr zû here. Wele dibêjin piştî demekê zûrîna  
gu-  
ran nêzîktir bû, her diçû nêzîk dibûn, mideteke kurt de birek gur

derdikevin pêşiya wî. Gur birçî bûn, agir ji devê wan diçû. Piştî demekê

zîlam û hespê wî avêtin... Berf bi xwînê sor kirin.'

Îlahî ezîm, min fikir ne fikir ez ji çîrok û serpêhatîyan xilas ne dibûm. Li

newala cinan, vê carê jî serpêhatîyeke min hat bîra min:

\*

Dawîya meha Gulanê bû. dî dinya gelek germ bû bû, hema bêje havîn

bû. Mîna hemî gundiyan em jî bi şev li ser banan radiketîn. Ez wê gavê 5-

6 salî bûm.

varê me zarokan bi hev re cihê xwe li dor sifreya xwarinê girt û me zikê

43

DARA GOZÊ

xwe, bi nan û mehîra ko li ser kaniyê hatibû sarkirin, têr kir. Ji ber ko

xaniyên me û cîranan bi hev ve hatibûn avakirin, ser banan wek mey-

daneke fireh bû. Wê şevê çend mêvanên me jî hebûn. Piştî ko diya min

nivînên me zarokan danîn, ez rabûm û çûm ketim nav nivînan. Ji cihê

min, bi qasê deh metreyan dûr, bavê min bi mêvanan re bû, ji xwe re so-

hbet dikirin. Li hêla din, ji me bîst metre dûr heft-heşt keç û jin li dora  
oberiyekê rûniştî şîre dibirîn...  
Piştî midetekê ez di xew re çûm. Li pişta xaniyê me ko ji erdê ne gelek  
bilind bû, ji bo xanîavakirinê cîranê me gelek kevir avêtibûn ser hev, hema bêje bilinbûna koma keviran gihaştibû ser xanî. Hêla pêşiya avahiyê vekirîbû û rêyek derbas dibû, nêzîkî xênî li ber dîwêr gelek teht  
hebûn. Ji pêşî, xanî bi qasê 5-6 metreyan bilind bû.  
Ez di xew de me, lê min hayê jê tune ko xewn e, bi gotina guran dora  
gund girtiye, min berê xwe da pişta xanî, min dît vaye gurekî devvekirî,  
diranên wî qîç di ser keviran re meşiya û xwe avête ser banî û ber bi min  
hat, (îcar ne xewn e, ez bira dibezim) ez hema ji nav nivînan rabûm û  
Xwedêyo tu quwet bidî piyan, bi qêrîn û hawara »gur hat!« ez reviyam, ji  
kêleka komika jinan bi bayê bazdanê ez çerixîm û ber bi hêla tehtan çûm,  
bi hawar û qêrîna min re bavê min, jinên şîreber, her yekî ji hêlekê gazî  
min dikir û bavê min li pey min baz dida. Çawa bû ez hîn jî nizanim, berê  
ko ez ji ser banî gêrî bin banî bibim, ango ji 5-6 metreyan xwe bavêjim ser

tehtan, tam li ser sifirneyê ez sekinîm û rûniştim. Edî bavê min jî gi-  
haştibû min...

Ez serê sibê gava ji xew şiyar bûm, ji min re bûyera şevê gotin, lê  
xewn

xeyal bi zor dihate bîra min. Dihate bîra min, lê ew tiştên ko dihatin  
bîra

min hên jî di bîra min de ne. Ez wê carê ji destê guran xilas bû bûm,  
lê ji

firîna min re jî tenê nîv metre mabû.

\*

Ez wê carê ji mirinê xilas bû bûm, lê bi van serpêhatî û bîranînan re  
sawa

tirsê li min giran dibû. Heya ji min dihat min dixwest ez xwe ji wê  
gerîne-

ka bîranîn û fikirên tirsê xilas bikim, lê karê min çî mixabin ne hêsa  
bû.

Ez midetekê di newalê de çûm; ji nişkê ve hespê min sekinî û rabû  
ser

lingên xwe yên dawî û şîhiya. Baş bû ko hefsar di destê min de şidayî  
û

min hespê xwe baş nasdikir, an na dê min biavêta. Min hewl da ko  
ez hes-

pê xwe sakin bikim, gava min li pêşiya xwe mêze kir, çî bibînim, vaye  
44

heywanek ko wek golikekê bû, li pêşiya min li ser rê sekiniye û  
rasterast li

min mêze dike. Lê ya ecib wî heywanî mîna insanekî mêze dikir. Min



dengê xwe bilind kir; bi hêviya ko ew golik xwe bide alî. Lê ji cihê  
xwe ne  
liviya. Min destê xwe avêt tifinga xwe, bi wê tevgera min re golikê  
çil da  
xwe û li paş hespî peyda bû. Bi tevgera golikê re hespê min jî ew  
teqîb  
dikir, mîna ko nexwaze piştta xwe bide wê heywanê. Careke din ji  
ber  
çavên min winda bû, min welê his kir ko ew heywan vaye li pey min  
si-  
war bûye, hema bi carekê min dest avêt xencera xwe û çend car bi  
hêz li  
pey xwe li hewa weşand. Bi rastî ji min re jî şikek çebû wekî ko ew  
hey-  
wan dixwaze li paş min siwarê hespê bibe. Bi xencer weşandina min  
re ew  
cardin li pêşiya min li ser rê xuya bû, geh li pêş geh li paş, geh li  
kêlekê,  
geh winda, geh xuya, me mideteke dirêj hev gerand heya em  
gihîştin qer-  
axa gelî. dî erdê rast û bê daristan, li pêşiya min xuya dibû.  
Piştî ko ez ji gelî, ji nava daristanê derketim, bi taqetek mezin min  
destê  
xwe avêt tifinga xwe, ji milê xwe danî, min berê hespê xwe  
vegerand, berê  
tifinga xwe da gelî û tifinga xwe di taritiya daristanê, newalê û şevê  
de vala

kir. Şîrqînî ji newalê rabû. Min cardin tifinga xwe avête milê xwe,  
min li  
newalê mêze kir; di nav taritiya daran de, du çav dibiriqîn. Piştî  
bêhnekê  
winda bûn. Min serê hespê xwe zivirand, berê xwe da riya gundê  
ko ez ê  
lê bimama mêvan û ajot...

45

DARA GOZÊ

5 - Hahîîhîî

Roja îne bû, li mizgefta gund, li dora hewiz sofî û kalên gundî rûniştî,  
li  
hêviya wexta limêja îne bûn. Havîn û kelekela germê bû. Hewizê ko  
gundî li dorê rûniştîne, serê banê wê girtî û aveke sar ji du çirikan  
datê  
hewiz. Ji wê hewizî jî av diherike diçe ser hewizekî ser û dor girtî ko  
gundî  
ji bo xuselê dikevinê. Ji hewizê pêşîn destmêj tê girtinê û herweha  
kesên tî  
bi tasa ser hewiz ava ko bi sarbûna xwe zebeşan diterizîne vedixwin.  
Beşîrê Cindî zebeşek avêtiye nav hewzê û bi sebir li bendê ye ko  
zebeş  
sar bibe. Sofî wek her carê li dora hewiz rûniştîne. Hecî Osman  
behsa  
qudreta Xwedê û qederê dike, dibêje:  
— Xwedê qadirê her tiştî ye. Carekê du mirov mînaqêşe dîkin, yek  
ji

wan dibêje Xweda qadirê her tiştî ye, dikare saniyeyekê bike salekê  
û  
salekê jî bike saniyeyekê; yê din dibêje ma çawa dibe? Yê ko  
baweriya wî  
piçek sist e, pêrgî serpêhatiyekî tê. Gava rojekê ji bo xuslê dikeve  
hewiz;  
pê re xwe li welatekî xerîb li ber çemekî dibîne... Ez meseleyê dirêj  
nekim,  
welhasil li wê derê bi salan dimîne, dizewice, dibe bavê du zarokan.  
Herweha gava rojekê dikeve çem, îca bîlekis xwe li hewizê ko  
bêhnek berê  
ketibû de dibîne. Bi wî awayî dibêje: eşedûbîllah Xwedê qadirê her  
tiştî  
ye.  
Dora avdanê ya mala Xalit bû, wî li nav bostanan avdanî dikir. Ber  
bi  
nîvro avdanî xilas kir û berê xwe da mizgeftê. Hat mizgeftê û derbasî  
ser  
hewiz bû. Çû jora hewiz li ber çirikan rûnişt, dest bi destmêjgirtinê  
kir...  
Bala wî çû ser dev delîngên wî, bi herî bûn. Ji cihê xwe rabû, çû jêra  
hewiz, delîngên xwe ji heriyê paqij kirin û cardin hat cihê xwe yê  
berê  
rûnişt, destmêjgirtina xwe domand...  
Li kêleka hewiz yek ji wan sofiyên rûniştî, bi dengê bilind got:  
— Hahîîî hahîîî...  
Beşîrê Cindî :  
— Înşelah xêr e Hecî Remezan?

Hecî Remezan dest pê kir:

— Heyra ez çî bêjim. Hinek berê ev xortê hanê hat û rasterast derbasî

46

jora hewiz bû, çû li ber çirikan rûnişt. Paşê ji wê derê, gava rabû çû jêra

hewiz rûnişt, min di dilê xwe de got, »vaye vî xortê hanê qedirê me kalan

girt û çû jêr,« min got »wele îcar dinya vaye baş bûye, lê piştê ko cardin

rabû çû cihê xwe yê berê, ez ji fikra xwe poşman, min got »na wele dinya

her xira dibe.« Hahî ya min ji ber vê yekê bû...

47

DARA GOZÊ

6 - Xwe gij bike

Ev cara sêyemîn bû ko Taco dizewicî. Xwedê rehma xwe li wan bike, her

du jinên wî yên berê mirin. Piştî mirina jina wî ya yekemîn, hin kustepist

ketin nav gund, lê bi mirina jina duyemîn re êdî kesê ko bi wan kustepis-

tan ne hesiya ne ma. Li ser tenûran dihate gotin: Herê keçê ma te ne

bîhîstiye, dibêjin mirina jinên Taco ji ber mezinahiya sit.. wî ye.

Rebenên

Xwedê!

Lê ya rastî hinan dixwest ew xwe biceribînin lê cesaret ne dikirin.

Piştî

çend mehan gotinên Nermê ya bî, ko digot ez ji çu tiştî natirsim,  
gihîştin

guhê Taco. Taco mirovên xwe şandin, Nermê hate xwestin.

varê, li mala Taco piştî xwarin û sohbetê heval û mirovên wî çûn  
malên

xwe, Taco û Nermê bi tenê man. Herê ez dibêjim bi tenê man, lê ya  
rast

ev e ko, li ser banî li ber rocinê çend mizirên gund, xwe bêdeng  
danîbûn

û li hêviya tiştine bûn... Taco û Nermê ketin nav nivînan, Nermê ji  
Taco

re weha got:

— Binê, ne hewce ye em fedî bikin. Bi rastî ez piçekî ditirsim. Divê  
tu

hêdî hêdî ... û bi diqet bî.

— Baş e.

Di nav nivînan de laşê wan li hev keliya... Nermê di nav ax û oxîn re  
ji

Taco re got:

— Hêdî, hêdî ..., heya ez bêjim bes!

— Baş eee...

Nermê:

— Piçek dî, piçek dî, piçek dîî....

Taco:

— Hew...

Nermê:

— De îcar xwe gij bike û lêxeee...

Ji wê şevê û vir de, gava xortan êzing hûr dikir, erd dikola, an karekî  
din

yê giran bikira, derhal henek dikirin û ji hev re digotin: Kuro, xwe gij  
ke

û kar bike...

48

7 - Heqê mesrefê

Ew karexezala çiyayê Zêrkan, keçikeke bejin orte, reng genimî,  
xwediyê

çavên reş ên mîna kil bû. Wê dilê gelek xortan bi xweşikbûna xwe  
dabû

ber pêlan; gava ji malê derdiket û diçû ser kaniyê an jî nav bexçe, ji  
awirên

bi kul û keser xilasiya wê ne mimkin bû. Gelek diyan nifir li wê dikir;  
ji

lewre wan di çavên lawên xwe de êş û elema xweşikbûna wê xezalê  
didît,

dilê wan bi zarokên wan dişewitî. Ew xezal ji maleke halxweş bû.

Erê

xortên gund dikizirîn lê kesî cesaret ne dikir ko xwe li mala bavê wê  
bi-

girin û wê ji xwe re bixwazin. Bêbavê bi spehitiya xwe dizanî, ji ber  
vê

yekê jî di nav hevalên xwe de hertim qure û pozbilind bû.

Kurê şêx yê xort û pozbilind ko di salên xwe yê kamilbûnê de bû, li

nav gund bi quretî digeriya. Rojekê gava ew xezal ji ser kaniyê dihat,  
pêrgî  
wî bû. Bi dîtina wê re qirik li wî ziwa bû. Piştî ko ew bihurî çû jî,  
awirên  
wî ji par ve tîr li wê dibarandin. Herê tîr li keçikê dihatine barandin  
lê ke-  
van bi xwe disincirî, kelên xwestinê babîlosk di dilê wî de radikir. Ji  
wê  
rojê û pê ve wî her çavên xwe li wê digerandin. Heta rojekê ber bi  
êvarê  
di nav zeviyê pembo de, wî kula dilê xwe, agirê di nav hinavên xwe  
de, li  
ser dilê wê sar kir...  
»Ax, ax hezar carî ax. Lawo bila ev şîreta min çu carî ji bîra we neçe.«  
Ev  
gotin ji devê Şemdîn yê şêst salî û mêrebî her tekrar dibûn. Xortan  
ji wî  
pirs dikir û wî jî bêwestan meseleya xwe ya zewacê ji wan re digot.  
»Nas  
û dost hatin gotin: 'Xalo, vaye me qîzeke hevdeh salî li gundekî  
quntara  
çiyayê Zêrkan ji te re diye. Heke bi dilê te be jî em ê ji te re wê  
bixwazin.'  
Em çûn, min keçik dît, bi rastî jî qîzeke pirr xweşik û delal bû. Min  
çu car  
bawer ne dikir ko wê keçikê bidin min. Ez li ko, ew keçik li ku. Di  
xew-

na şevan de jî min yeke welê ne dîtibû. Ji bo pesindana wê ez çî  
bêjim jî  
dê kêmbê. Lawo hema bi kurtî ez bêjim, wele û bîle bêbavê mîna  
horiyên  
buhuştê bû. Min ji nas û dostên ko alîkariya min dikir pirsî, ka ew  
henekên xwe bi min dikin, mesele çî ye. Gotin 'Na, ne henek e, vaye  
heya  
hefteyekê em te dizewicînin.'

Werhasil ez serê we neêşînim, paşê çûn, keçik anîn mala min, dost  
û

49

#### DARA GOZÊ

mirovan me bi hev re xwarin xwar; xewn û xeyal lê ez bi wê re  
zewicîm.

Lawo ma min ji ko dizanî, ew keça bêbav dê serê sibê rabe biçe mala  
bavê

xwe, gundê xwe.« Xortan jê pirs dikir, digot: »Xalê Şemdîn ma te  
ewqas

mesref lê kir ma tu bi wê re raneketî?« Şemdîn di bin zimbêlan re  
dibişirî

û bersîv dida: »Çawa ez raneketim, ez xalê we me, wele ez du caran  
bi wê

re razam. Hema çî be jî min heqê mesrefa xwe derxist.«

50

#### Komûtan

Cara yekemîn bi cîpa eskerî hat û li ber qereqolê peya bû. Avahiya



qereqolê li perê gund li hêla rojhelatê, xaniyekî yek qat bû. Di eslê  
xwe de  
wî dixwest cîpa xwe li qeraxa gund bide sekinandinê û bi rêçûna  
xwe ya  
eskerî di nav gund de piyase bike, da ko temamê gundiyan, wî bi  
bejn û  
bala wî, bi kinc û meşa wî ya eskerî, bi rutbeya wî ya »komûtan«  
bibînin.  
Di xwest di roja pêşîn de xofekê têxe dilê wan.  
Piştî ko xwendegeha leşkerî di sala şêst û nehan de xilas kir, ev cihê  
wî  
yê yekemîn bû ko wî dê dest bi kar bikira. Dilê wî germ, bi daxwaz  
û bi  
heyecan bû. Bi şewq û serbilindî dê xizmet bikira. »Şaristaniya  
bilind« ya  
ko li xwendegeha eskerî fêrbû bû dê li derûdora xwe, li gundan bi  
reşan-  
dana, dê wek çirayekê, di nav tarîtiya newal û çiyên de şewq bida.  
Gava di deriyê hewşa qereqolê re kete hundir onbaşiyek û deh  
esker  
ketibûn rêzê û li hêviya wî bûn. Piştî silav û teqdîmên eskerî ew  
derbasî  
bin çardaxa li hewşa qereqolê bû. Ber êvarê bû, gundî hîn ji karên  
xwe  
yên rojane venegeriyabûn malê. Ji lewre komûtan di dilê xwe de  
meraq  
dikir ka gelo çima wî kes ji gundiyan ne dîtibû. Hema bêje li ser riya  
xwe

rastî tu kesî ne hatibû, ji bilî zarokan. Ji xwe gava çavên zarokan bi  
esker-  
an diket, zarokan xwe dida alî, an jî li pişt daran, keviran, dîwaran  
xwe  
vedişartin û bi dizî li rêçûna eskeran dinêhêrtin.  
Piştî çend rojan li deverê herkesî êdî dizanî ko komûtanekî nuh  
hatiye.  
Ji gund û gundên derûdor kesên ko li qereqolê çay vedixwarin, hatin  
li  
komûtan bi xêrhatin kirin, »çaya xwe« vexwarin xwe dan nasîn û  
çûn. Wî  
bi xwe jî hemî rapor û dosyayên derheqê gund û gundên derûdor  
xwendin. Wî êdî dizanî ka kî tê çaya wan li qereqolê vedixwe.  
Ev çend roj bûn ko Filo tevî pismamê xwe Mûsa li gundekî nêzî sînor  
li hêviya »malê« xwe bûn. Roja îne xeber dan wan gotin »malê« we  
dê îşev  
teslîmê we bibe û divê di eynî şevê de hûn ji sînor derbas bibin...  
Filo û  
Mûsa bi alîkariya rêberan li ser pişt hespên xwe û bergîrek barkirî  
ji sînor  
derbasî hundir bûn. Herçî Mûsa ev cara çaran bû, lê Filo ev cara  
yekemîn

51

DARA GOZÊ

bû ko dihat qaçaxiyê. Filo hin pere deyn kiribû, hin jî ji firotina çend  
bizin û mêşinên xwe bi dest xistibû.

Ev du hefte bûn ko bi roj li gundên nas an jî di şikeftan de diman, bi

şev bi dîqet ber bi gundê xwe diçûn. Jibo ji rêçûna hespan deng  
neyê

simên hespên xwe kulav kiribûn. Niha bi tenê riya çend saetan li  
pêşiya

wan ma bû, jibo ko bigehên malê.

Filo zewicî û bavê du zarokan bû, zarok hîn piçûk bûn, nan û xweya  
çar

kesan ketibû stûyê wî. Jina Filo dizanî karê qaçaxiyê dijwar e, gelek  
kes

hatine kuştin, girtin, an birîndar bûne, wê ne dixwest Filoyê wê here  
qaçaxiyê, lê Filo carekê biryara xwe da bû, dê biçûya. Filo dixwest  
bi karê

qaçaxiyê hin peran bide serhev da ko paşê karibe ji xwe re zeviyekê  
bikire.

Ji jina xwe re digot: »Ma wek herkesî parçeyekî erdê me jî hebe  
xirab e?«

Şeva ko sibetir dê Filo birêketana, di nav cihan de Filo li ber jina xwe  
di-

geriya, dixwest berê çûyîna xwe dilê wê xweş bike, wî soz da wê got  
»piştî

vegerê ez dê bazinekî zêrîn î buha ji te ra bikirim.« Jina wî rondikên  
xwe

di tariya şevê de bi goşeya lihêfê zuha kirin, xwe nêzîkî Filo kir û ket  
hem-

bêza wî.

Meco bi tirkî digot:

— Komûtanê min, min xeber stendiye ko sibe bi şev dê hin qaçaxçî  
di

newala Kûsiyan re derbas bibin. Pîrr mimkun e ko barê wan pîrr hêja be.

Komûtan ji kêfan ne dikarî li cihê xwe bisekine, devê wî ji hev diçû; di

bin simbêlan re dikeniya.

Nobedar ji komûtan û mêvanê wî re çay anî. Komûtan ji Mecu re got

» pîrr baş e, hertim bila welê çavên te vekirîbin. Ez vî tiştê te kiriye ji bîr

nakim. Aferîn ji te re.« Derengê şevê Mecu xatir ji komûtan xwest, ket

riya gundê xwe .

Komûtan tevî heft eskeran roja dotir ber bi newala ko Mecu salix dabû,

bi rê ketin. Hatin di newalê de bi cih bûn, ketin kemînan û li hêviya qaçaxçiyên man. Derengê şevê çend qeretûn xuya bûn. Edî dilê komûtan

û eskeran bi hêztir lê dida. Piştî ko qeretûn hatin nêzîkî wan, berî ko bi

îşareta komûtan li wan bi teqînin, eskerek jibo çîpê xwe yê tevizî rehet

bike lingê xwe yê çepê dirêj kir, bi livîna wî re kevirek gêr bû, bi gêrbûna

kevêrê re Filo û Mûsa ketin tevdîrê, bi »dengê teslîm bibin, dora we hatiye girtin« li wan hate teqandin, hespên wan veciniqîn. Filo û Mûsa

berê hespên xwe dan kêleka şiverê da ko di nav daran de xwe winda bikin.

Di wê gelemşeyê de bergîr ji dest wan filitî û ber bi pêş ve çû...

52

Filo û Mûsa di nav daristanê de rêça xwe winda kirin, lê bergîrê wan kete destê komûtan û eskerên wî.

Derengê şevê hîv bilind bû bû. Dinya di bin heyveronê de bû. Piştî çend saetan gihaştin qereqolê. Bi emrê komûtan anîn barê bergîr danîn,

hejdeh mawzer bûn. Komûtan ji kêfan dikir bifire. Eskeran, jê re av anîn

ser û çavê xwe bi ava sar şûşt. Li bin çardaxê rûnişt; li hêviya qehweyê bû.

Sebra wî ne dihat, fikrên curbicur di serê wî de diçûn û dihatên, ne dikarî li ser tu hizrekê bisekine, bifikire; tu rastiye bêjî ji fikrên tevayî bêtir, parçeyên hin ramanan di hişî wî de divejîn û winda dibûn, ew diçûn hinên din peyda dibûn. Piştî qehwe vexwarinê rabû ser xwe, li bin

çardaxê çend car çû û hat; her difikirî. Meşiya çû ser banê qereqolê, dest

bi piyaseyê kir. Li asîman fikir, berê xwe da rojhelat, di dilê xwe de »ev roj

çima hilnayê îro« got, hêrs bû; nifirek kir. Ji hêlekê ji serkeftin û bidestx-

istiyên xwe sermest bû bû; ne dixwest wê serkeftinê bi hinên din re par ve

bike; li hêla din ji kêfa xwe re li şîrîkan digeriya, dixwest dinya alem hemî

pê bizanin; werin, wî karê payebilind bibînin, bibihîzin û wî pîroz bikin.

Li çiya mêze kir, di nav tariya şevê de çiya bi xof û heybet dixuya.

»Ev çiya

jî nahêle ko roj zû derbê« got, bîstekê sekinî, bi gotinên xwe keniya.

»Ez

jî ema bûme pitpitok« got û hinek din jî keniya... Çû li ber kevirên li ber

banê qereqolê qûçkirî sekinî, piyê xwe yê çepê danî ser koma keviran, di

bin roniyê heyvê de li siya xwe temaşe kir... Ji berîka xwe paketek derxist

cixareyek xiste nav lêvên xwe, pêxist, serê xwe piçek bilind kir; niha pişta

wî rast, sînga wî nepixî û zik ber bi hundir kişandî bû; cardin li siya xwe

fekir; bi kêf û bi temaşekirina siya xwe çend nefes li cixareyê xistin...

Meşiya hat qeraxa pêşîn ya xênî sekinî, ji jor de ji ser banê li çekên ber

qereqolê fikir; bîbilkên çavên wî dibiriqîn, eger baskên wî hebûna dê

firek bidaya xwe û xwe bera ser wan çekan bida; mîna teyrekî ko nêçîra

xwe dixê nav pencên xwe dê wî jî her wisa bikira.

Ji ser banê qereqolê daket hat bin çardaxê, fikireke balkêş hate hiş wî,

xwe bi xwe »bila bibînin, bila ji wan re bibe ders« got. Gazî nobedaran

kir, ji wan re got »van çekan hildin û li pêşiya qereqolê sêpikan çêkin.»

Eskeran sêpik çêkirin. Komûtan rabû, ber bi riya ko di ber qereqolê re derbas dibû çû, di nav rê de sekinî û li sêpikan mêzekir, lê ne eciband.

Got »çekan li ber dîwar rêz bikin!« wek wî gote kirin. Careke din çû ji dûr

ve li çekan fikir, ji wê derê emir da » bila piçek ji hev firk bin! » ... »  
temam

temam îcar çêbû, muhteşem xuya dikin« got û hat li bin çardaxê rûnişt.

dî sibe bû. Roj ji piştî çiyê bi şewq bilind dibû, tîrêjên wê asîmanê  
53

## DARA GOZÊ

gund zûde ronî kiribû. Gundî wek her carê piştî limêj û xurîniyê jibo herin nav zeviyên xwe dihatin û di ber qereqolê re derbas dibûn. Lê wê

sibehê guhertinek balkêş xwe li pêş awêrin wan dida xuya kirin; nam-

lûyên çekên li ber dîwarê qereqolê rêz kirî dibiriqîn û li bin çardaxa qereqolê ling li ser lingan rûniştî, ji cixara komûtan duxan hildikişiya...

54

Jiyaneke weha bê mane ye!

Min li ser bircên bajarê xwe ew nas kir. Nuha lê difikirim, lê xwezî  
min  
ne ew mirov bidîta û ne jî derdê wî bibihîsta. Ji xwe piştî axaftina  
me, min  
ew nema dît. Roja dinê min terka bajêr da; lê gotinên wî baş tên  
bîra min.  
Mideteke dirêj bû ko ez ji bajarê xwe dûr mabûm. Bi çî awayî biba  
jî di-  
vê min serîkî lê bida. Ez çûm. Piştî demeke dirêj vegeza min ya  
welêt, bû  
bû sebebê pêlên bîranînan. Kolan û taxên bajêr li ber çavên min  
vedijîn,  
dibûn dîmenên renga reng. Bajar gelekî hatibû guhertin. Dîmenên  
ko  
berê di bîra min de ma bûn an jî di mejiyê min de bi cih bû bûn bi  
yên  
nuh re tevlihev dibûn. Min hewl dida ko ez wan bidim ber hev û lê  
hûr  
bibim ka kîjan ji wan bêtir spehî ne. Geh yê kevin geh yê nuh bi  
ser  
diketin. Şerê di navbera wan de dijwar bû. Gava ev kolan û avahiyên  
kevin yê ko kultur û tarîxa bajêr diyar dikir li ser piyan bûn û li ber  
ça-  
van bi her awayî xwe nîşan didan ez pê kêfxweş dibûm, kela dilê  
min  
radibû, pêlên bîranînan di ser hev re diqulubîn; ez dibûm zaroyekî  
deh  
salî û di nav wan kolan û awahiyên de dibeziyam. Lê li hin cihan gava



min di şûna wan avahiyên kevin de avahiyên 'nuh' didîtin, dilê min  
di-  
hat givaştin, bîr û xeyalên min tevlîhev dibûn min zarotiya xwe tê  
de ne  
didît. Ma malxirabno we ne dikarî li cihekî din ev avahiyên xwe yên  
'nuh'  
ava bikirana. Ma çî heqê we hebû ko hûn jiyana min, xeyalên min,  
bîranînên min ji hev bikin û bidin ber kêran!  
Xeyal, bîranîn... Carina ez welê bi xeyalan re dijiyam ko min  
derûdora  
xwe, hevalên xwe ji bîr dikirin. Erê tiştên ko wan digot û dengê  
mirovan  
ji hawirdor dihat guhên min, lê mîna ko ji çend sed metreyan wek  
kustepistê dihat û dibuhurî. Ji xwe min jî guhdariya wan ne dikir.  
Roj,  
hefte û meh bihurîn. Herçiqas hîn jî carina mirov an hevalên min bi  
min  
re der diketin jî, lê yek caran min dixwest ez bi tenê bigerim.  
Kesera dilê min, bircên bajarê min bûn. Erê hin birîn di laşê bircên  
wî  
de çêbû bûn; pirr eşkere xuya dibû ko bê xwedî ne û kesek birînên  
wan  
derman nake, li gel hawar û fixanê jî şênîyên bajêr bê deng bûn.  
Rast e  
serî li bircan hatibû şikestin, lêbelê hîn jî ji qudret û spehitiya xwe  
ne  
55  
DARA GOZÊ

ketibûn. Li derûdora wan avahiyên bilind hatibûn avakirin û wek  
berê ji  
dûr ne dixuyan; lê her di cihê xwe de bûn. Bi hemî ezamet û  
heşmeta xwe  
mîna ko bêjin 'em hebûn û hene' û bi hev re xwe mîma ejderhayekî  
reş î  
gewr li bin rojê kilorkirî vezelandibûn.  
Ber êvarê, germiya hewayê şikestibû; ez ji malê derketim û min  
berê  
xwe da Deriyê Mêrdînê û meşiyam. Piştî ko ez gihîştim ber bircan  
ez bi  
derenceyekê re hêdî hêdî hilkişiyam jor. Li wê derê min bîstekê  
bêhna  
xwe vekir, berê xwe da hêla rojhelat û ez li ser bircan meşiyam. Bi  
hemdê  
xwe, geh li bajêr, geh li nav bexçeyên Hewselê yên li biniya bajarî,  
min  
mêze dikir. Li ser bircan carina rastî hinan dihatim.  
Ez ji gera li ser bircan her mîna berê gelekî kêfxweş dibûm. Hefteyê  
du-  
sê caran miheqeq ez diçûm. Roja yekşemê ez cardin çûm, lê berî wê  
carê  
tiştêkî bala min kişandibû: Mirovekî dora sîh salî li ser bedenê -dibe  
ko  
wekî min ji xwe re digeriya- bû. Lê tiştê balkêş ev du sê car bû dihat  
û her

li eynî cihî rûdinişt, berê wî li başûr li jêr li nav bexçeyên Hewselê  
mêze  
dikir. Ji ber ko ev çend car bû em pêrgî hev hatibûn me êdî şiklê hev  
di-  
nasî. Vê carê jî gava min ew li wir dît min ji xwe re got: ez ê bi vî  
mirovî  
re bipeyîvim. Gava ez gihîştim cem wî min silav lê kir, bê ko ji cihê  
xwe  
rabe serê xwe zivirand, piştî ko dît yê ko silav lê kiriye ez im, rabû  
ser xwe  
silava min wergirt. Min destê xwe dirêjî wî kir me destê hev hejand.  
Em li kêleka hev rûniştin. Bexçeyên Hewselê, çemê Dicle, avahî û  
koşkên xuyayî bûn mijarê sohbetê me. Piştî bêhnvedaneke dirêj ez  
rabûm ser xwe min jê xatir xwest û ez meşiyam. Ew mirov cardin li  
cihê  
xwe rûnişt.  
Roja dinê ji min re bû meraq gelo ew mirov çima diçe her li eynî cihî  
rû-  
dine û diponije. Ma ev tiştê normal bû? Ber êvarê ez cardin ji malê  
der-  
ketim û min berê xwe da bircan. Belê, ew li wir bû. Ez çûm cem wî.  
Li  
kêleka wî rûniştim, bi rûniştina min re wek ko ji nişkê ve ji xewnê  
şiyar  
bibe li min mêze kir, di demeke pirr kurt de bi awirên xwe mîna ko  
bêje  
tu kê yî, nêrî, lê wî ez naskirim an jî ez hatim bîra wî; got »li min  
bibuhure,

hişê min li dereke din bû.«

Piştî halê hev pirsîn û bîstekê sohbetê, min hêviya lêbuhurînê lê kir  
û

got: »Ev çend car in ko ez te li vir her li eynî cihê rûniştî dibînim. Xêre?  
«

Wî mirovî berê xwe da min, di awirên wî de gelek pirs û meraq hebûn.

Bi awirên xwe 'gelo ez bersîva pirsan bidim an na, gelo ew çima van  
pir-

san dike', digot. Piştî bêhneke xweş, wî destê xwe xiste berîka xwe  
pake-

56

ta cixarê derxist, ewil dirêjî min kir, paşê cixareyek jê kişand, xiste  
nav

lêvên xwe, bi pêxistinê re çend hilmên giran kişandin. Derûdora wî  
di

nav duxana cixarê de ma, lê bi xêra cihê me dixan tavil ji hev belav  
dibû.

Wî mirovî dest pê kir û got: »Bira, ez ji ko dest pê bikim, tu rastiye  
bêjî

min ne dixwest ez pirsgerikên ko min diêşînin ji kesî re bêjim. Lê  
madem

tu pirr meraq dikî, ez dê bi kurtî ji te re bêjim. Mimkin e bersîva  
pirsên

ko min diêşînin û rehet nahêlin li cem te peyda bin? Heke ez rastiye  
bêjim, ev halê me ango zêde nenasîna min û te bi kêrî min tê. Ji  
lewre ez

bi şêweyeke rehet dikarim behsa xwe bikim.« Serê xwe rakir li min  
mêze  
kir, belkî dixwest ji rûyê min fêmbike ka ez guhdariya wî dikim an  
na.  
»Belê, nuha tiştê ko min diêşîne ev e: Ji zaroktiya min heta nuha  
min  
her bi ya derûdor û bi ya mezinan kir. Gava ez zaroktiya xwe didim  
aqilê  
xwe her ji min re ji zarokên din re digotin, 'guh-dariya dê û bavê xwe  
û  
mezinan bikin'; li dibistanê gotin 'bi ya mamosteyan bike, guh bide  
wan,'  
li cihên kar gotin 'bi ya patronê xwe bike' bi saya hin hevalan ez  
bûm en-  
damê partiyeke siyasî û li wê derê her gotin 'bi ya fermanên partiyê  
û  
serokê wê bike'; gava min eskerî kir, gotin 'ferman û komutan  
hertişt in';  
piştî eskeriyê ez hatim malê, ez nuha sîh salî me. Jiyana xwe ya borî  
didim  
aqilê xwe, li derûdora xwe dinêrim, ji bilî ko min bi ya hinên din  
kiriye  
tiştêkî din ne kiriye! Ez serê te neêşînim, jiyaneke weha bê mane  
ye.'  
Bêhneke dirêj em herdu jî bédeng man, paşê wî axaftina xwe  
domand,  
'belê bira, ka tu çi dibêjî?'  
Ez mit û mat mam. Ez ji gotinên wî yê dawiyê veciniqîm, tirsiyam;

»jiyaneke weha bê mane ye« mebesta wî ji van gotinan çi bû?  
Dixwest çi  
bêje, dixwest çi bike? Dihat li ser bircên berz rûdinişt, ma gelo  
întîxarê di-  
fikirî? Ma min dikarî ez bersîva pirsê wî bidim? Min dê çi bigota. Ez  
midetekê fikirîm; lê çu bersîvek ko ez bi xwe pê razî bim ne hate  
bîra min,  
hîn jî ne hatiye!

57

DARA GOZÊ

Dergeha Evîndaran

Aşiqbûyîn awayeke dînîtî ye, Sigmund Freud

Ferhadê Cembelî û hevalê wî yê herî canecan, Metînê Neco, carinan  
dilê

xwe ji hev re vedikirin û hemî ew birîn û êşên ko ji destê jiyân û  
zehmetiyên jiyânê dîtibûn, eşkere dikirin; lê bi ya wan dostan,  
dijwariya

herî giran, derdê dilan, evîna yaran bû.

varekê ew û hevalê xwe li meyxaneyê Derya rûniştibûn û di binê  
gelek

qedehan de bang dabûn; mij û dûmana sermestiyê li ser serê wan  
kom bû

bû û xwe hêdî hêdî li hemî bedena wan dipêça. Ferhad şûşeya dilê  
xwe

careke din vekir û got:

Kekê min ji derdê evînê axx û ax, hezar car ax bi ser hev de ax! Ez  
yek ji

wan mirovan im yê n ko zû bi kula evînê dikevin. Hema li ko derê  
keçikek  
an jineke xweşik bibînim û eger bala xwe baş bidim û bi baldana  
xwe re  
lê hûr bibim û eger ev yeke hanê di nav çend rojan de dubare bibe,  
wê  
gavê wey û hezar car wey ji halê min ê belengaz re, êdî min mala  
xwe bi  
destê xwe xira kiriye. Hemî alim û zanayên dunyayê bicivin jî nikarin  
min ji nexweşiya ko ez pê ketime bifilitînin. Hekîmê Lokman li ba  
min  
be û şev û roj li ber serê min rûne jî feyde nake; Metîncan ey ne tu  
nizanî  
ev derdê bê derman çi bela ye! Bila Xwedê Teala gurên serê çiya û  
newalan bi vî quzulqurtê nexîne. Ev bela bila bibe para dijminê min  
yên  
herî bêbav!  
(Ferhad di navê re qedeha xwe radike, »noş« dibêje û axaftina xwe  
dewan  
dike.)  
Ez bi xwe nizanim ka dunya alem jî wek min e an na? Lê dil eee, him  
dibêje min hewalbend divên, min hemderd divên; bila ez zanibim  
ko  
nexweşê bê derman ne tenê ye, dost û hevalên wî jî hene; him jî  
dibêje  
derdê evînê û hezkirinê giran e, ez naxwazim kesek vî barê giran  
hilde û  
bi vî nexweşiya bê çare bikeve.

Cano, de ka îşev bibe hemderdê min, bi min re çend qedehên din  
 bi-  
 noşîne û guh bide birayê xwe, ez ê ji te re çîrokên evîniyê, yên ko  
 hatine  
 serê min, bêjim. Piçekî kula dilê xwe sivik bikim, were bibe rêvekirê  
 birê  
 xwe da ko bi qedehên meyê re ez xwe berdim nav çemê evînê.  
 Bibim mê-  
 vanê wan bêbavan, wan gulperiyên. Bihêle kekê min, bila ez di nav  
 pêlên  
 evînê de di nav pêlên şerabê de bêm coşê, bila dil û rih bibin yek,  
 bila tu  
 perde di nav me de nemînin. Bila bi meyê ez meyxoş bibim, bi  
 meyxoşî  
 ez serxweş bibim. Bihêle bila ez bifirim, ji bedena giran derkevim,  
 xwe  
 bigehînim mekana dilxweşan, îskana meyxoşan, dergeha  
 serxweşan; ew  
 dikarî min bibînin, nas bikin, min vexwînin, min sermest bikin, bila  
 ew  
 bêjin eyyy ruhê pak tu bi xêr hatî!  
 (Şingînî ji qedehan radibe. »Noşşş!« Ferhad axaftina xwe dewam  
 dike...)  
 (Kejê)  
 Kekê min, cara yekemîn gava ez bûm aşiqê keçeke xweşik; wê gavê,  
 min



hîn di dibistana navîn, di sefa duduyan de dixwend. Li ber dilê min navê  
keçikê Kejê bû. Keçikeke bejin li hev û dirêj, di bin kirasê wê yê reş yê  
xwendegehê de memikên wê mîna du hinarên deqandî xuya dibûn.  
Nebêje hey mal wêran, ma tu ji ko dizanî, ew welê deqandî bûn...  
Ax ax!  
Hinarikên ruyê wê hertim pembe bûn. Ruyekî girover, bêvileke li hev li  
ruyê wê, sipehiya çavên wê zelal û bê leke, rengên çavan kesk, eniyeke  
fireh, porê wê ji rengên qehweî û zer têvel û bi pêl bû, porekî dirêj,  
xwe ji  
jor xelek bi xelek ber bi jêr ber dida, te digot qey hertim li ber sura bayê  
di pêldanê de ye. (Ferhad li hewayê bi destan wêneya xelek û pêlên porê  
Kejê çêdike.) Aha ew keçika bêbav di sinifa min de bû. Wê karexezalê  
hefteyê pênc rojên xwedê, dilê min ê belengaz dida ber pêlên coşê ji hal  
dixist, ez per û perîşan dikirim. Carina welê lê dihat ko min ji devê mamoste çu tiştêk fêhm ne dikir. Belê û belê, her çî qas min li mamoste  
mêze dikir, lê aqil û fikir li cem keçikê bûn. Eger rojek nehata dibistanê,  
tavilê ez diketim şikê, ji min re wes wese çêdibû, min xwe bi xwe digot:

Gelo nexweş e, jibo çî ne hatiye? Min, li cihê wê yê runiştinê, bi çavên

xwe yên melûl mêze dikir...

(Ferhad qedehê radike, dibêje »noş kekê min noş, ji roniya çavên wê

keçikê re noş.« Bi van gotinên Ferhad re, Metîn dizane ko dawiya vê

59

DARA GOZÊ

çîrokê ye. Ji xwe ne cara pêşîn e ko dibihîze. Dizane ko tayîna bavê keçikê

rabû bû bajarekî din û evîna Ferhad hatibû qurmiçandin.)

(Metîn ji cixareya xwe ya destpêçanê nefesek baş dikişîne û mîna ko do-

ra axaftinê ya wî be dest pê dike. Ew jî behsa evîna xwe ya pêşîn dike:)

(Gulperî)

Kekê min, xwezî wî rojê min rojname nekiriya û ez di ber rojnamefiroşê

li ber sînemaya Dîlanê nesekînîbama. Ji xwe hertim welê bi serê mirov tê.

Mirov pêşîn guh nade û wek tişteki edetî dibîne; lê gava paşê lê difikire,

wê gavê ax û wax êdî fêde nake, kekê min.

Danê êvarê, saet dora çaran bû. Germîya hewayê di wê saetê de dişikê. Ez

çi bibînim, Ferhadcan, keçikeke bejin zirav, sipê û sipehê, bi meşeke  
nerm  
û bi xwe bawer, ber bi qulûbeya rojnamefiroş dihat. Goya min  
rojname  
dixwend, lê ne çav ne jî mejî êdî wî karî dikin. Herdu jî biliyê keçikê  
bûne  
bi heyranî li wê mêze dikin û difikirin... (Metîn serê xwe radike, mîna  
ko  
li asîman mêze bike, dibêje:) Ey Xwedayê erd û asîman, ey Şahê  
Keremê  
ma xweşikên wisa li vî welatî, li vî bajarî, li vî taxê, li vî kolanê hene!  
Bila  
Zelîxaya Usif, bila Leylaya Mecnûn, bila Şêrîna Ferhad porê xwe kur  
bikin, bila ji qedera xwe re bigirîn, ma ew çi tofan bû, ma ew çi heyv  
bû,  
ma Zîn û Stîyê ew bidîta dê şerm nekira? Kekê min, wele û hezar car  
wele  
û bîle, ez wisa fikirîm. Lê, min baş fêhm ne kir, keçikê kovarek an jî  
roj-  
nameyek kirî, piştî zivirî ber bi rojava meşiya. Min jî mîna yekî  
efsûnkirî  
da pey wê. Bê ko ez lê bifikirim an jî zanibim ka ez çi dikim, li pey  
wê  
midetek meşiyam. Di ber deriyê avahiyeke berz de ez li xwe  
varqiliyam.  
Keçika bejingul di deriyê apartmanê re ket hundir û ji ber çavan  
winda  
bû... Ez midetekê bê ko zanibim çi dikim an bikim li cihê xwe mam...

Ji nişkê ve yekî destê xwe danî ser milê min û tişteki got ko min fam  
ne  
kir. Ez zivirîm, lê mîna yekî ko ji xewê bête şiyarkirin, ez hîn jî, ne li  
ser  
hişê xwe bûm. Min his dikir ko çawa xwîn xwe dide serûçavê min.  
Bû  
pilpila min, min tiştin gotin lê pîne ne dibûn... Nasekî min bû, paşê  
min  
mesele jê re got, pirqînî pê ket...  
(Bi van gotinan re pirqînî bi Ferhad û Metîn jî ket. Qedeh cardin  
hatin  
rakirin... Metîn nefeseke din li cixareya xwe da û çend beyt li pey  
hev rêz  
kirin :)  
60

Dilo carek were cem me  
Hezar sal e benda te me  
Dilo carek were cem me.  
Bi evîna Mem û Zînê  
Bi taqeta Fer û Şînê  
Dilo carek were cem me.  
Wê ez birim kebab kirim  
Ji bîr û hiş bêpar kirim  
Dilo carek were cem me.  
Xeman bibe yaran bîne  
Derdan bibe derman bîne  
Dilo carek were cem me.

Van qedehan binoşîne  
Ji xezalan neêşîne  
Dilo carek were cem me.  
Meyperest im, ez serbest im  
Ji evînê ez sermest im  
Dilo carek were cem me.  
Li gel heval û serxoşan  
Di dergeha, di meyxoşan  
Dilo carek were cem me.  
(Garson ji wan re hin pêvexwarin û mey tîne... Jineke stranbêj  
strana  
Hîcranê dibêje. Midetekê guh didin wê. Paşê Ferhad dibêje:)  
Kekê min niha ev jinik jî dibêje ez stranbêj im. Bi rastî gava ez guh  
didim  
ên wek vê jinikê stranbêjeke mîna Emelê li ber çavê min dibe  
melîke;  
melîkeya stranbêjan. Keko gava Emel strana Hîcranê dibêje mirov  
pê re  
dihele, carekê dengê wê ji nîva kezebê dertê, dengê pak û zelal,  
dengê  
ji kêrahiya rih, stranbêj bi xwe pê re dijî, wisa ko mirov dikeve ber  
pêlên  
hîcranê, derd û kul bi ser hev ve diqulubin, ax û keser gul vedidin,  
bi wê

61

DARA GOZÊ

êş û elemê re mirov gêj dibe, serxweşiyêke guhertî xwe dide der, di  
wê  
midetê de mirov ji jiyânê ji dunyayê dûr dikeve; dunyayêke xusûsî  
ji  
mirov re peyda dibe. Bi strana wê re şikil û şemala wê li ber çavên  
mirov  
dibe horiya buhuştê, çavên wê yên binevşî bi hezaran dilan  
diguvişînin, li  
ber roniyê çavên wê mirov ji taqet dikeve, pê re sist dibe, dunya di  
nav  
şewqê de dimîne...  
(Metîn dibêje »Ferhad mîna ko tu aşiqê Emelê bî?«, Ferhad »na  
wele«  
dibêje. Lê nema pesnê wê dide...)  
(Metîn bi rakirina qedehê re gotina Ferhad dibire û pê re dibije  
»hinekî  
din jî serê te xweş be tu yê doza Emelê bikî. Noşşş!« Şîngînî ji  
piyaleyan  
radibe... Bi bîranîn û evînê li binê qedehên meyê bang didin. Behsa  
jiyanê, behsa jinan dikin; felsefe, evîn û ruh li ser maseya wan kon  
vedikin. Geh li hev dikin geh li dijî hev radibin. Di dawiyê de li hev  
dikin;  
dibêjin em kapên xwe bavêjin em binêrin ka îşev çî dibe qismetê  
me; ji  
mêvanên sohbetê me kî bi ser dikeve!... Derengê şevê bû, rabûn ji  
meyx-  
aneyê derketin. Berê xwe dan resteûranta Stêrkê. Li rê vêca milmila  
Metîn bû, gotin li bin guhê hev siwar dikirin:)

Evîn ew e, ew evîn e  
Şerab ew e, ew şerab e  
Ew oldar e, evîndar e  
Vaye diçim wê dergehê.  
Mekan ew e, bihuşt ew e  
Ew dunya ye, min war ew e  
Xweşî ew e, xezal ew e  
Vaye diçim wê dergehê.  
Ew dergeha me bê hişan  
Digel hemî dil serxoşan  
Spasdarê wan meyxoşan  
Vaye diçim wê dergehê.  
Bi hîkmeta şêxê mîran  
Bi xelweta şahê dilan  
62

Bi şehweta gula rezan  
Vaye diçim wê dergehê  
Ger zerî bim, îsewî bim  
Ger memoî an mûsî bim  
Ger ateyî an bûdî bim  
Vaye diçim wê dergehê.  
(Xeyalek jiyayî)

Ferhad û Metîn dikevin restaûranta Stêrkê. Li pêş, li nêzî cihê reqşê rû-  
dinin. Piştî xwestina vexwarin û bîstekê sohbetê li derûdora xwe dinêrin.

Li maseyên derûdor gelek jin û mêr hene. Li milê rastê li maseya  
kêleka  
wan çar jin rûniştîne. Jin bala wan dikişînin. Çar jinên sipehî, dido ji  
wan  
piçekî qelew in li herduyê din zirav in. Çavên Ferhad li remzekê  
dikeve,  
remz li piyê keçika bejinzirav ko kirasekî reş î teng heya bi ser çokên  
wê  
dadikeve û bê pî ye; û hemî mêbûn û sipehîbûna bedena keçikê  
dide der,  
lê ye; Ferhad meraq dike jê dipirse gelo ew çî ye? Keçik bi kêfxweşî  
piyê  
xwe hinekî ber bi Ferhad dide û dibêje ev gul e ev jî tor e. Rengê  
remzê  
keskekî tarî nêzî rengê şîn e. Wisa ye an jî Ferhad wisa dibîne. Gava  
Ferhad vê pirsê ji keçikê dike bala keçikên din jî dikişîne. Piştî ew  
jî  
piyên xwe nîşan didin, remz li ser piyên wan jî hene. Remzên cuda...  
Ferhad bi ser Metîn ve dizivire... Noş dibêjin, qedehên vexwarinê  
radibin. Stranbêj û koma muzîk karê xwe dikin. Jin û mêr cot bi cot  
li ci-  
hê reqsê, her cotek li gorî zewqa xwe li ber muzîkê direqese.  
Hevbeşiya re-  
qsê heye lê bi qasî wê, ferq jî di navbeyna kesên direqisin xuya dibe.  
Metîn ji maseya kêlekê jinekê dawetî reqsê dike. Diçin direqisin.  
Ferhad li derûdora xwe, li meydana reqsê dinêre, vê êvarê tişt li ber  
çavên



Ferhad piçekî guhertî dixuyên; dixwaze bala xwe bide nuxteyekê û  
lê  
binêre. Belê dikare lê binêre, him jî çiqasî bixwaze, tişt li ber çavên  
Ferhad  
pir zelal dibin. Lê Ferhad xwe ji baldana nuxteyê vedikişîne; ji  
piyaleyê  
qurtek din vedixwe. Dixwaze bedena keçikekê bifikire; ji xewnên  
şevan,  
ji xeyalxaneyê mejiyê xwe yekê dineqîne, keçik bi hemî spehîbûna  
xwe,  
çîp tazî li ber çavên Ferhad vedije. Ferhad şaş dimîne, haho haho  
dibêje,  
ev çî bejin û bal e, ev çî horî ye? Li ber serê keçikê rûdine, porê wê  
miz  
dide û ji ber serê wê li bedena wê dinêre, ji memikên wê dibuhure,  
li navi-  
ka wê dinêre, nêrîna xwe ber bi jêr dibe, pûncek mûyên zer, berzika  
wê

63

DARA GOZÊ

dibîne... Li gotinek digere ko bi lêv bike; divê gotin sipehîbûna  
keçikê  
binimîne, bi tenê gotina mikemel tê bîra wî.  
Metîn ji reqsê vegeyriyaye, vêca Ferhad radibe keçika bejinzirav  
dawetî  
reqsê dike. Li gel ko keçikê cixareya xwe hîn nuh pêxistiye jî radibe.

Ferhad û keçika bejinzirav li meydana reqsê li ber muzîkeke nerm  
ko ji  
deng û aletên koma muzîsyenan bilind dibû, di hemêza hev de li  
gorî rî-  
tim û teqla muzîkê direqisin. Piştî du reqsan hatin li cihê xwe  
rûniştin...

Piştî sohbeteke kurt û çend qurt vexwarinê, dengê muzîkê cardin  
bilind bû. Vê carê keçika bejinzirav destê xwe li piyê Ferhad xist û jê  
daxwaz kir ko bireqisin. Ferhad bi kêfxweşî ji cihê xwe rabû, ket piyê  
keçikê û çûn cihê reqsê. Muzîk muzîka reqsa nerm a hemêzkirinê  
bû.

Ferhad û keçika bejinzirav xwe bera nav pêlên reqsê û muzîkê dan...  
Ferhad berê jî şik kiribû ko rewşa wî ne ya hergavî ye; derûdor,  
insan,  
muzîk, deng bi awayekî din, bi awayekî nejiyayî, nebihîstî, nedîtî li  
ber  
çavên wî, guhên wî, vedijyan. Birûskan li mejiyê Ferhad cîrît diavêt,  
li ser  
hev mîna fîşekên hewayî diteqîyan. Wêne û dîmenên ko li ber  
ronahiya  
birûskan dixuyan, wisa zelal wisa zelal bûn ko Ferhad dikarî li  
nuxteyeke  
herî hûr û piçûk hûr bibe, wêneyê wê nuxteyê li ber çavên xwe bi  
hemî  
xweşî û rengên xwe ve hezar carî mezin bike... Lê birûskan zêde rê  
ne di-  
da, li pey hev şîrqînî ji wan radibû, xumîn û gumîna dengê wan bû.

Ferhad fikirî, ez li ko me, ev xewn e, xeyal e, ev çi ye? Ferhad li dora  
xwe  
nêrî, belê li meydana reqsê bû, bi keçikekê re reqs dikir; Ferhad da  
aqilê  
xwe, ji xwe re fikirî, got gelo ez li ser hişê xwe me yan na? Destê  
rastê li  
pişta keçikê pêçayî bû, destê Ferhad yê din û destê keçikê yê rastê  
di nav  
hev de bûn. Ferhad destê xwe ji destê wê vekir. Niha herdu dest li  
hem-  
ber hev vekirî bûn; lê kefa destê wan li hev bû; Ferhad xwest  
biceribîne ka  
şiyar e an na? Hersê tiliyên xwe xistin nav tiliyên keçikê, lê biryar da  
ko  
tiliya piçûk û ya mezin di rasta tiliyên wê de bigire û bi wî awayî fam  
bike  
ko li ser hişê xwe ye an na? Ferhad wisa jî kir û dît ko li ser hişê xwe  
ye;  
dev ji lîstika tiliyan berda.  
Dengê muzîkê, dengê stranbêj ji berê hezar car zêdetir zelal û safî  
dihat  
guhên Ferhad. Ferhad, biryar da ko çavên xwe bigire; bi girtina  
çavan re  
Ferhad xwest ko ew û keçika bejinzirav li wê meydana reqsê bi tenê  
bimînin. Niha meydana reqsê vala bû bû, bi tenê du kes li ber  
muzîkê di-  
reqisin, stran ji bo wan tîn gotin, Ferhad li gorî rîtim û teqla muzîkê

gavên xwe diavêje; canê Ferhad sivik bûye, wisa sivik bûye ko bi keçikê re

li ba ketiye, êdî nizane ka ew reqsê digerîne an keçik? Ferhad dixwaze

64

dengê stranbêj bibihîze, birûskek lê dide, hemî wêneyên din tar û mar

dibin, niha Ferhad bi tenê dengê stranbêj dibihîze, di nav gotinên stranê

de »I love you« bi nermî mîna şîfonê xwe li canê Ferhad dide, muzîk hes-

tên Ferhad vedijîne, dilê wî li ber pêlên muzîkê, li ber pêlên gotinan li ber

pêlên hestan, dikele; xwîna Ferhad niha di rehên Ferhad de wek birûskan

lê dide, tê coşê, pêl di ser hev re diqulibin, di yek saniyeyê de ji ber pêçiyên

wî dest pê dike, di eynî saniyeyê de, li tememê rehên bedena wî digere û

vedigere cihê xwe yê berê; lê nasekine dewrî daîm dibe. Digere, digere û

digere... Ferhad cardin, difikire ev xewn e, xeyale, jiyana e, çi ye? Ferhad

çavên xwe vedike, li dora xwe dinêre, dibîne ko vaye gelek kesên din wekî

wî direqisin. Xwe bi xwe dibêje ez di xew re çûme, bi vê keçikê re li gel ko

ez di xew de bûm, reqisîme û vaye direqisim. Ferhad dide aqilê xwe  
dibê-  
je dem çi ye, dem heye, saniye, deqîqe, saet, roj, meh, sal, sedsal,  
hezar sal  
hene, çi ne? Çawa mirov dikare di çend saniyeyan de ewqas bifikire,  
di  
xew re here, bireqise, çi bixwaze karibe wî bifikire, bi bîr bîne, lê hûr  
bibe,  
gelo mimkin e? Heke mimkin be wê gavê maneya wext çi ye? Ma  
wext  
heye an me insanan wext daniye? Mekan mekan dibêje, min karî ez  
vê  
rasteyê ji xelkê vala bikim. Bi tenê li gel vê keçika bejinzirav  
bimînim. Ma  
mekan heye, ez heme, ev keçika ko bi min re direqise heye? Ev  
dengên ko  
tên guhên min, ev muzîka ko min dihejîne, dilê min dike volqan  
heye?  
Ferhad dibêje, looo Ferhadoo, tu heyî, tu direqisî, ew tiştên ko tu  
difikirî  
tev hene...  
Birûskeke din lê dixê, wexta ko mirov pê li pişkoja awizeyê ji  
krîstal  
dike û bi ronahiyê re, çawa ko tîrêjên ronahiyê li hebên krîstalan  
didin û  
dibin hezar parçe û derûdor di bin ronahiyeke xweş, e ji hezar  
rengan

pêkhatî û neqîşandî dimîne, niha derûdor li ber çavên Ferhad wisa zelal,  
wisa pak û wisa rengareng bû. Bînahiya çavên Ferhad pir xurt bû bû, her tişt wek kefa destê xwe didît; Ferhad piçekî veciniqî, fikirî, ji xwe re got ma gelo îşev ev bêbavên awîzeyan, lembeyan çima wisa dibiriqin, çima ronahiya wan wisa sed qat zêde bûye? Ferhad di nav xeyal, wext, cih, xewn, şiyarbûn, hebûn û tunebûnê de diçû û dihat. Bedena wî sivik bû bû, xwe mîna perikek his dikir, sivik, nerm û rehet. Ferhad difikirî, li bedena xwe difikirî, li teqla muzîkê difikirî, li ahenga gav avêtinê ya reqsê difikirî... Erê bi riya guhan muzîk dibihîst, lê deng û rîتما muzîkê ketibû nav canê Ferhad, tevî xwîna wî bû bû, ew notayên ko muzîk pê dihat xuluqandin niha di rehên Ferhad de bûn, êdî Ferhad lê ne difikirî ka teqla muzîkê çawa ye? Ji ber ko muzîk di

65

DARA GOZÊ

dilê wî de bû, ew bi xwe bû bû parçeyek ji muzîkê, an jî muzîk bû bû parçeyek ji wî, ahenga muzîk û reqsê û gav avêtina Ferhad bi keçika bjinzirav re sedî sedî li hev bûn, ne sedî sed, sedî milyon li hev bûn. Bi

qasê zereyek jî xeletî, bêahengî tune bû.  
Brûskeke din li serê Ferhad lê dide. Erd û asîman dihejin, asîman di-  
terize, şaxên ronahiyê li rûyê asîman vedibin, bi her şaxekê re hezar  
wêne  
divejin, bi her wêneyê re bi milyonan gul û kulîlk peyda dibin. Birûsk  
li  
pey hev lê didin, dunya bi asîman re dibe yek, valahî namîne, erd û  
asî-  
man digîjin hev, di nav hev de dikelin, dipijiqin, kaînat di nav roniyê  
de  
dimîne, niha her der roniyê, ji bilî ronahiyê Ferhad tiştê nabîne.  
Ronahî ronahiyeke bê dawî, yeke abadîn. Ferhad di nav wê  
ronahiyê de  
cismen tune ye, ew jî bûye parçeyek ronahiyê, di nav ronahiyê de li  
xwe  
nagere, hewce nabîne, ji hemî êş û elemên bedenî û ruhî xilas  
bûye...  
Di nav wê ronahiyê de brûskeke din lê dide, Ferhad dengê muzîkê  
ne-  
ma dibihîze. Ew û keçik sekinîne, reqs bi dawî hatiye... Li hev  
dinêrin...  
Ferhad nizane ka dê çi bêje. Keçik dibişire, Ferhad jî dibişire... Muzîk  
cardin dest pê dike, reqsa duyemîn dest pê dike... Ferhad bi dilxweşî  
û  
nermî serê xwe ber bi jînikê dibe, rûyê wan digihîje hev. Ferhad  
nermî û  
germiya alûşka wê his dike. Bi destê xwe yê rastê newqa keçikê  
heya bi ser

kulîmekan miz dide. Keçik xwe bêtir bi Ferhad ve dizeliqîne. Ferhad dev

ji mizdanê berdide, dixwaze fena berê di hemêza keçikê de di xew re here,

bi keçikê re bibe yek. Îşev siûda Ferhad heye. Ferhad çî bixwaze, çî daxwaz bike, mejî fermanên wî pêk tîne, an jî mejî fermanên xwe, daxwaza xwe pêk tîne.

Birûskeke din lê dide. Ferhad radihêje keçikê û bi firê dikevin.

Sivikbûna Ferhad derbasî keçika bejinzirav bûye. Ew jî bûye mîna Ferhad, Ferhad difikire, dibêje min digot qey ez tenê sivik bûme, vaye ev

keçik jî mîna min e, ew jî dikare bifire, bi min re bigere... Boraq, boraq tê

bîra Ferhad. Ferhad dibêje ev bejinzirav jî boraqa min e. Lê ez li boraqê

siwar nabim, em di hemêza hev de difirin, niha wisa xweştir e. Ferhad û

bejinzirav di ber gelek stêrkan re dibuhurin, stêrkên sor, stêrkên sipî,

stêrkên zer û şîn dibînin. Ferhad difikire, dibêje em li stêrkekê daynin, av

û hewa tîn bîra Ferhad, difikire ko bê av û bê hewa ne mimkin e bijîn.

Feylesofên yûnanan tîn bîra wî, yên ko behsa jiyanê dikirin, behsa hewa,

ax, av û agir dikirin... Ferhad tî bûye, dixwaze avê vexwe dibêje av jiyan

e, jiyan bê avê nabe, av av!!!



Birûskeke din lê dide, Ferhad nermî û germiya bejinziravê his dike,  
66

Ferhad difikire, xwe bi xwe dibêje jiyan çi ye? Em çi ne, ez û ev keçik  
em  
çi ne, em çima li vir direqîsin? Ma xweşiya jiyanê reqs e, vexwarin  
e,  
hebûn e, gelo çi ye? An jiyan ev keçika bejinzirav e? Mimkin e ko ev  
keçik  
jiyan bi xwe be. Dibe ko bi xêra wê ez van xewn û xeyalan dibînim,  
dijîm,  
his dikim, di kûrahiya dilê xwe de, di mejiyê xwe de bi lêdana  
birûskan re  
beden û rihê min têkel hev dibin, cih diguherin, rih dibe can û can  
dibe  
rih, beden sivik dibe, sivik. Bi rih re dibe yek, dubendî, giraniya  
beden,  
hebûna beden ya şikilî namîne, ji hev dikeve, dihele, dibe ronî, di  
nav  
ronahiyê de digehîje bêsînoriyê, dem, mekan, ev der û ew der  
namînin...  
Di mejiyê Ferhad de şîrqînî ji birûskeke din tê. Ferhad çavên xwe  
vedike, lê ya rastiyê çavên wî hertim vekirîbûn, lê gava difikirî, xeyal  
dikir, çavên wî nema tiştêkî didît. Îşev mejiyê Ferhad hakimê wî ye.  
Ji  
xwe Ferhad ji bilî mejiyê xwe, tiştêkî din his nake. Gava his dike jî bi  
fer-

mana mejî kare his bike. Deriyê fikirîn û hiskirinê îşev tenê û bi tenê  
bi

birûskan vedibe û bi birûskan tê girtinê.

Ferhad bi wê keçika bejinzirav re, wê êvarê, li wê cihê reqsê, li ber  
wê

muzîka sihrî, di nav wan xeyal û xewnên efsûnî de, di bin lêdana  
heybe-

ta birûskan de, bi ezameta şîrqîn û gumîna dengê wan, li ber tîrêjên  
roniya wan, li mehîneke sipî û bi bask siwar bûye; hefsarê ramanê  
xistiye

destê xwe, bi qamçiya destê xwe birûskan divejîne; direqise û  
dreqise...

naxwaze şiyar be; mîna derwêşên dergeha mewlewî zîz dibe, li  
dergeha

evîndaran direqise, direqise û direqise...

Û Metînê Neco, li rewşa hevalê xwe dinêre, dibişire û xwe bi xwe  
dibê-

je:

Gelo xêr e, îşev cardin bayê evînê lê rabûye?

67

DARA GOZÊ

68

Beşê kirmanckî (zazakî)

69

DARA GOZÊ

Bircanê Diyarbekirî ra mektubêke

Birawo,

Belê, newroz emsarr serranê verî ra ciya hame pîrozkerdiş. Çend aşmî ra

ver bi waştişê şarê Diyarbekirî, belediyey Diyarbekirî qerar dabi ko newroz bi awayêke weş bêro pîrozkerdiş. Ez do (go) etya qaso ko taqetê

min ê nûştişî dest bido û ziwanê min bigeyro, şima rê şahî û pîrozkerdişê

newrozî binûsî. Bi nûştiş, bi kelîman îfadekerdişê heme weşî û renganê

newrozî zehmet o. Labelê semedê xusûsiyetê mektubnûştişî ez enî rêzan

nûsena. Eger dimacû wextê şima bibo û şima temaşey fîlmanê newrozî

bikerê şima go qestê min fam bikerê.

Ez wazena şahî û pîroziya enî rocî ra çend nimûnan binûsî. Etya, enî çıyanê ko ez do biyarî şima çıman ver, çiyê ko min bi xu diyê û çiyê ke

hevalanê min, min rê behskerdê yê. Bê ko ez derg bikerî û serey şima

bidecnî, de bêre ma piya raşteraşt şêre temaşeyê operaya Memê Alanî.

Şewa newrozî

Şewa newrozî, badê ko tarî kewte erdî ser, di seet heşt de, di banê tiyatroy

de operay Memê Alanî dest pa kerd. Di salone de cayêke tenê zî veng nê-

mendbi. Herçiqaş banê tiyatroy pîl o zî, cayêke pîlêr do baştir bibiyayêne.

Semedo ko ena raya ewilîne bî, destane Memê Alanî bi awayêke weş di

şaristanê Diyarbekirî de, verê çimanê temaşe-kerdoxan de ze tabloyêke

ko hunermendêke renganê xu bi sebir û dîqqet, ser o bi ca bikero hameyne xuliqnayîş.

Herçiqaş di şanê newrozî de bi seyan kes semedo ko yew bilet xu dest

fîno di verê berê tiyatroy de kom bi zî hêviya îne bi ca niyamî. Bilête ena

şewe, di aşmî verocû qediyaybî. Hameyne vatiş ko ena ray peyey bazarê

siyay, siyarotoxî bêkar mendîbî.

Ez zehf zereşkiyaye wa, semedo ko ez nêşkena bi nûştiş ena opera bi

heme huner û weşiya cay û ay hissê ko di wextê temaşekerdişî de merdimî

71

DARA GOZÊ

de peyda benê, biyarî ziwana. Belê, wexta merdimî temaşey operay kerdêne, merdim şîne dinya û heyatêke bîn. Di a dinya de ciwamêrdî bî

bi xewf û heybet bî. Cinî bî, bi rindiyey xu horî bî. Merdim geh di  
cenet,  
geh di cehnim de bi. Geh di hewno şêrîn, geh zindan de bi. Hewn û  
xeyal, ters û heybet, merdî û bêbextî, başî û nebaşî, feqîrî û pêtî,  
hevalî û  
neyarî, hezkerdiş û kîndarî, bi kilmî to vatêne qey merdim  
parçeyêke  
tarîxê însaniyetî ciwiyêno. Heme tabloyan di verê çîmanê merdimî  
de  
şîkil girotêne û hameyne bedelnayîş. Bi asanî ez şîkena vacî ko rihê  
deng-  
bêjanê ma yê merdan şa bi. Vengê hunermendan pêl bi pêl di  
miyanê dol  
û newalan de, serê koyan ra, di asîmanê welatê ma de, çar goşan ra  
weşî û  
şayî kerde vila. Vanê emşo di asîmanê koy Agrî de, estarey Ehmedê  
Xanî  
hergo hewe zehfêrî şewq dayne. Zehf merdimî kelegirî bî. Keynanê  
ci-  
wanan semedê heskerdişê (sînayîşê) Mem û Zîne, di a salona tarî  
de we-  
sar û payîz xu vîrî ard. Xortê ciwanî îne ra kemêr nêbî. Eger  
destbidayne  
do zehf ciwamerdan semedê heyfê Memî êriş bikerdêne sehnî ser.  
Belê,  
merdim nêzano di temaşekerdişê ena opera de çî hissî şarî de peyda  
bî.

Tenê Homa û hiskerdoxê ma zanê kamco hissî di rihê îne de newe  
ra

xuliqiyay...

Di şanê newrozî de televîzyonî ena opera dîrekt mocnay (nawite).  
Merdimê ko nêşkay şêrê temaşe, qîmê xu bi televîzyonî ard.  
Labelê ganî

merdim vaco ko qediyayîşê opera dima, di şanê newrozî de,  
temaşe-ker-

doxan bi xeyalanê ciya-ciyayan xu verra da miyanê tariyê şewe. Her  
merdimêke bi xeyal û hêviyê xu, bi fikir û waştîşê xu, kêfweş yan zî  
xemgîn...

Helbet pîrozkerdişê newrozî tenî bi operay Memê Alanî nêbi. Badê  
opera, waştîşê henî embazan ser ro, ma helîkopterêke weniştî ko  
ma di asî-

manê Diyarbekirî de bigeyrê û bivînê ko di ena şewa tarî de cor de  
şaristan

senîn eyseno. Zege min verî zî vatbi, ez do hewl bidî ko qe nêbo  
menzer-

ayêke biyarî çimanê şima ver, eger ena menzera zehf rengîne nêbo  
zî.

Di asîmanê Diyarbekirî de

Belê, ma di tariyê şewê newrozî de, bi helîkopter di asîmanê  
Diyarbekirî

de geyrenê. Siûdê ma esto, hewr di asîman de nêeyseno. Şewêke  
çîksayî

ya. Di asîman de estarey bi heme weşiyê xu temaşey ma kenê.

Heme şe-

wan zêdeyêr (vîşêr) roşin ê. Ti vanê qey ê zî ma dir newroz pîroz kenê. Ma

cor de temaşe kenê, şaristan di miyanê rengan de mendo. Gelo ena keskî-

72

sor a di ena şewa tarî de eysena? Nê nê. Ena keskîsorê ma wa. Keskîsorê

newrozî wa. Belê, wexto ko ma nizdî ro bajarê Diyarbekirî yê kanî kenê,

bi weşiyê menzerawa eysayî, ma konê miyanê xeyalan. Bedenê Diyarbekirî seraser hamewo xemelnayîş. Roşnayî zey aw herekêna. Bedeno rengîn çimanê merdimî ver de şiklanê zehf bedeliyayeyan gêno.

Henî rayan zey gilayanê mûndan ê Xeca Koy Sîpanî eysenê. Eger merdim hayî ro ci nêbo ko di helîkopterêke de wo, bêguman merdim

wazeno cor de xu berzo miyanê enî daristanê gilayan... Bi têdiyayîşê helîkoptere ena ray rismêkew bîn yeno xuliqnayîş. Bedenê Diyarbekirî

kofiyânê ciniyanê kurdan anê verê çimanê merdimî. Ay kofiyê rengînî û

bi zêran xemalnaye eysenê. Diyarbekir di verê çimanê merdimî de beno

zey ciniyêke rind e ko di tarî şewe de tê geyrena. Banê berzî, gilay mûndey, bedeno nexşîn tabloya hunermendî tamam kenê. Kela zerê

merdimî wirzena, germbiyayişê canê merdimî hîna lez geyrayişê  
gunî ano  
vîrê merdimî. Ma di asîmanê Diyarbekirî de, bi zerêka germine, ro  
zerê  
bajarî temaşe kenê...  
Rochelatê şaristanî de çemê Dîcle herekêno. Roşnê şaristanî ver,  
wexto  
ko merdim cor de hanêno, vînenno ko Dîcle bi awayêkew bîn  
herekêna,  
roşnayî awê Dîcle bedelnawa. ko hereknayiş û pêlanê aw ra nêbo  
ez do  
vacî ena Dîcle niya... Adirê newrozî, di serê bedenê vakurî yê en  
berzî de  
bi heme pîroziya xu, ver bi asîman pêl dano. Ti vanê semedê  
rizgarkerdişê  
Memî, Tajdînî banê xu veyşnawo... Hendî Padîşah di serê sîniya xu  
de  
kankilanê gozan nêvînenno. Adirê newrozî hendî gozêre tenî  
nêverdeno.  
Di asîmanê Diyarbekirî de fîşekê hewayî teqenê. Belê, bi renganê  
ciya-  
ciyayan, di asîman de bi fîşekanê hewayiyan »newroz Pîroz Bo«  
yeno  
nûştiş. Di binê asîmanê Diyarbekirî de, ena şewa tarî de zehf çî  
eysenê...  
Ez serey şima nêdecnî.  
Rocê newrozî



Zege şîma zanê, rocê newrozî ma kar nêkenê. Roşan o. Badê arahî,  
ma  
çend embazî piya veciyay miyanê bajarî. Ma va ma banî ka di eno  
roco  
weş de diyarbekirî newrozê xu senîn pîroz kenê. Ma verê xu şa  
miyanê  
şaristanî, şaristanê kanî. Herçiqas lazim niyo ez vacî, la şarê şaristanî  
bi  
cilanê xu yê mîllîyan rengêkew bîn dayne enî rocî. Di serê rehîrê xu  
de ma  
pê hesiyay ko di miyanê şaristanî de trafîk vinderto. Badî coy ma ra  
hame  
vatiş ko semedê şahî, di miyanê bajarî de trafîk dawo vindertiş...

73

## DARA GOZÊ

Belê, ez senîn vacî? Çar hetanê Diyarbekirî ra vengê def û zirna bîne  
berz. Di eno roco weş de, bi waştîşê belediya Diyarbekirî,  
belediyanê ma  
yê bînan ra govendgêrî (koçekî) hameybî şirawtiş. Enka çar hetanê  
bajarî  
ra enî grûbê govende, bi govenda xu ya mehelli, bi hunermendî,  
kuçanê  
Diyarbekirî ra ver bi rastey Şêx Seîdî herekiyayne. Hergû grûbe en  
tay se  
kesî ra viraziyaybî. Xortê çelengî, keyney bedewî dest bi dest, pêl bi  
pêl

leqayne. To vatê qey mergê zozanan ê Serhedî yê. Hewayke şenikî  
eno  
deryay gul û vilan şanayne tê. Şarê bajarî di kiştê rehîran de,  
temaşey îne  
kerdêne. Henî reyan bi tilîlî û çepikan ê zî têkilê govende bîne.  
Badê grûbêke govende, grûbê komedî veciyay. Herçî bi veciyayişê  
nê  
komikan tûtî zehf kêfweş bîne. Tûtan bi hewar û qîrrî waştêne  
kolikanê  
pîlan ser o temaşey komikanê komedî bikerê. Raştiko ê grûbanê  
komedî  
zî kêfêkew ciya dayne enî rocî û kêfê tûtan ser ra çîke çinêbi. Tûtî bi  
zer-  
weşî hewayne û kêf kerdêne.  
Badê demêke, enî grûbê govende pêro resay rasteş Şêx Seîdî. Ewca  
serekê belediye kilm xeberî da. Badê xeberdayîşî ena ray heme  
grûban  
piya bi hewt def û zirnan govende girote. Ena menzera sosin,  
beybûn,  
pirpizêk, nêrgiz û vilê bihvêran ardêne vîrê merdimî. Enî veng û  
menz-  
ereyan, xuliqnayîş û xumiyane tebetî ko di wesarê welatê ma de  
ameynê  
meydan, bi awayêkew tesîrin di xorîniya hissanê merdimî de cay xu  
girotêne. Herê, şima zanê, min verî zî vatbi, ez hendî nêşkena ena  
tablo  
teswîr bikerî. Werreka şaîra ma wa namedare Binefşa Xezale etya  
bibîne

û di cay min de şîma rê binuştêne.  
Di dormarê Diyarbekirî de, diyarbakiricî di seyran-gehan, miyanê gul  
û vilan de newrozî bi tewir tewir şahiyân pêroz kenê. La etya verî ko ez xu  
vîr a kerî, lazim o ez vacî, eyro roc rocê hezkerdoxan o. hezkerdoxî xu  
keyeyanê xu ra fînenê dûrî ko nîzdî waştanê xu bibê. Bi seyran xort  
û  
keyney Diyarbekirî, di verê çemê Dicle de, dest destê jobînî de, di miyanê  
xeyalan de, bi vatişanê şêrînan pê dir xeberî danê, lewanê engemînan  
jobînî ra wazenê. Gulê sûrî û gulê pembey vişkoyênê. Çemê Dicle bi bar  
o, barê yê giran o la bi kêfweşî herekêno, Mem û Zîna Cizîra Botanî rê  
silamanê xort û keynanê Amedî beno. Hezkerdoxî bi hêviya ko biresê  
Mem û Zîne, qevdanê vilan, nêrgîzan, gulanê sûr û pembeyan erzenê  
miyanê çemê hezkerdişî... Ê vanê hergû serre, di vîst û yewê Edare de  
Mem û Zîne newe ra xuliqênê û di kuçanê Cizîra Botanî de, di verê çemê  
Dicle de tenî hezkerdoxan ra eysenê.  
Veyşanî ver ma gêj biy. Kêf û şahiya enî rocî ra ma wer kerdibi xu vîr a.

Ma weriştî şî keye. Ma boya xu day, dima ra ma verê sifreykew  
mîrankî

de niştî ro, wer werd. Şan de ma do şirin stadyûmê Pîlî.

Piyes

Belê, enka ma kewtê zerey stadyûmî û ma di cay xu de ronîştê.

Qasêke

badê cûy do piyes dest pa kero. Program çende babetan ra  
viraziyawo la

ez do şima rê tenî behsê piyesê Padîşahî bikerî. Piyes bi destê  
merkeza

kulturî hamewo amadekerdiş û bi awayêke hemdem hamewo  
şîrovek-

erdiş. Di stadyûm de cawo veng nêendo. Nizdî vîst hezar  
temaşeker-

doxî do temaşey piyesî bikerê. Tv zî do raşterast piyesî bimocno.

Piyes bi kemîkerdişê roşnî û bi muzîkêkew xofin dest pê keno. Pêlê  
recfe yenê merdimî. Padîşahêke bi heme xof û nebaşiya xu, bi  
eskeranê xu

wa kono zere. Ma enka di dinyayêka bîne, dinyayêka kane de, enka  
ra bi

hezar serran verî ciwiyênê. Pêlê roşnayî, cilê Padîşahî û eskeranê  
cê,

motîfê ko eysenê heme têdir nê hissan însanî de peyda kenê.

Kaykerdoxî

xeberî danê, la ma vengê îne nêşinawenê. Hereket û muzîk, çiyê ko  
benê,

merdim seyrê piyesî ra fam keno. Çar kenaranê meydanê piyesî ra hêdî

hêdî merdimê bînî eysenê. Heyatê însananê ay çaxî eyseno. Ma şarî ra

asinkar, koşkar, şiwane, citêr, rezwan û gelekî xebatkaranê bînan vînenê.

Padîşah rehet niyo. Eskerê cê, di lez û bez de yê. Pêlê xofê eskeranê Padîşahî tersêkew pîl di miyanê şarî de peyda kenê. Her gama ko şina,

riyê erdî ver bi cahnim yeno bedelnayîş. Heyat beno ezabêkew giran...

Badê demêke, miyanê şarî ra tevgerê henî merdiman dest pê keno. Muzîk

merdimî şano tê. Çar kenaranê stadyûmî ra veng yeno. Çirûskê (çiqlikê)

adirî eysenê. Tîrêjê roşnî ra-ray benê geşî. Bi keft û leftêke pîle, di miyanê

mij û dumanî de, roşnayî tariya şewe darena we. Padîşah û eskerê xu

nêşkenê xu vera adir û tîrêjanê roşnayî bipawê. Muzîk yeno bedelnayîş.

Kêfweşî hem bi muzîk hem zî bi piyes yena pîrozkerdiş. Vîst hezar temaşekerdox çepikan kuweno. Diyarbekirîcî »tarîxê« xu ra riperran vî-

nenê. Bi sereberzî û xemremnayeyî stadyûm ra vecênê. Beno ko zey min,

di hewnê gelekî temaşekerdoxan de zî piyes bêro tekrarkerdiş.

Bi kilmî newrozê ma yê emsarrî di şaristanê Diyarbekirî de, bi enewa

hame pîrozkerdiş. Reyna zî newrozê şima heminan pîroz bo. Heme rocê

şima bi şayî, bi kêfweşî û xeman ra dûrî bivêrê...

Diyarbakir, 22.03.2021

75

DARA GOZÊ

Gozêre

Min di dewêke de cayê xu girot. Heyatê min, kê min, weşî û nêweşiya

min, viyarteyê min heme etya yê. Wazena verê ko ez behsê xu bikerî, bi

kilmî bo zî dewê xu bidî naskerdiş. Verê ko ez bêrî dinya û kokê xu vera

bidî binê erdî û di serê riyê zemînî de şax bidî û berz bibî, awankerdoxê

cê hameyê etya ronawo û ena dewe awan kerda. Di xortaniya xu de, min

reyêke waşt ez dewican ra perskerî ka gelo ê ça ra hameyê, verûcû ça biyê,

la heyf min cesaret nêkerd. Min va, ê go (do) bi min bihewê; yariya xu bi

min bikerê; go vacê ti kam a, yê ko heyat dawo to ma yê; ti seyîn persanê

anakî ma ra kena?

Ena dewa ko ez tede wa, di qerajê koyêke de viraziyawa. Erê raşt o, no

ko zehf berz niyo; la gorey dormarê xu koyêkew berz yeno qebûlkerdiş.

Di qerajê koy de hîrayî ser o yew-di û dergî ser o bi qasê çend kîlome-

treyan raştayêke esto. Di binê enî raştî de berziyêke -ku rêzila sî û zinaran

ra viraziyêna- ze dêsêkew tebiî di binê dewe de seraser derg biya.

Eno ca-

wo ko dewe tede hameya awankerdiş maneno sedirêke. Ti vanê qey ena

dewe di serê a sedire de nişta ro; paşta xu dawa koy û lingê xu veredayê

acêr. Gorey dewanê dormarê xu, dewêka pîl a. Qeybê ke serê bananê îne

pê wa hameyê awankerdiş û zehf reyan dêsê kiştan bi şîrîkî hameyê vi-

raştiş; cor ra, serê koy ra banê dewe ze raştayêko hîra eysenê û kuçeyê

miyanê banan teng ê, dûrî ra weş nêeysenê.

Zimistanan hewa serd o; vewre zehf varena; locinanê banan ra

dûyêkew tenik beno berz; loma zî wexto ko yewo xerîb dewanê pey koy

ra bêro û cor ra, serê koy ra banîro, eger dûyê locinan ra nêbo go niyaro

xu vîrî ko dewêka pîle di binê vewre de wa.

Hinî berziyê koy bi daranê mazêran pişte yê; labelê hetê rocawanî rût û

repal o. Enka zî weş yeno vîrê min, heya wextê xortaneya min, eno der û

dor heme daristan bi. Ay çaxan dewa ma zî zehf qelebalix nêbî. Di miyanê ay daristanan de heme tewir teyr û tebûrî, heywanê koyî peyda

bîne. Vergê harî gege hameyne nizdiyê dewe û zûrayne. Daristan mekanê

heş û weşanê koyiyan, liwan, kuzan, arwêşan, pilûran û gelekî bînan bi;

76

di miyanê daristanî de enî tewir heywanî di dinyay xu de ciwiyayne. Derheqê koyiyan de zehf meseley û estanikî estê, labelê ez etya behsê îne

nêkena. Bi pîlbiyayîşê dewe, vêşîbiyayîşê dewican û ramitişê erdan, verra

verra ay daristanî biy vinî. Enka zeke sereyêkew keçel, etya û ûca çend

darî mendê. Ez şima rê sirrêke xu vacî la yewî ra mevacê. Raştiko ez zehf

tersayne; min vatêne go rocêke dore bêro min zî, go bêrê serey min zî tera

bikerê; weşî û bextiyariya dinya ra min bêpar verdê; çimkî di verê çimanê

min de çend way û biray min bi xîzaranê pîlan kerdbî erd ra. Ez bi rocan

bermawa. Bermayîşê min him semedê îne ra him zî semedê halê min, ter-



sê min ra bi. La şikir Homay rê, heta enka dore niyameya min.  
Ver bi rochelat ko berziyan û dolan ra viraziyêno. Di hetê rochelatî  
de,  
berziyê rêzilanê koy di reyêke de nêbiriyênê; hetanî des kîlometrey  
de-  
wam kenê. Qerajê koyan bi rezan piştayê. Di miyanê rezan de ca-ca  
vamêr û miroyêrî benê berzî; hetê engure û şîrney engure ra dewa  
ma ze-  
hf pêt a.  
Ez cay xu ra heme enî dewan û gomeyanê ko di hetê vakûrî de  
hamey  
awankerdiş vîna. Ma ra zehf dûrî niyê. Dûriya yew yewî bi pay  
qasê  
seetêke, yê bînan zî di seetî rehîr o. Dewê ko di pey koy de yê min  
ra nêy-  
senê; derheqê îne de ez zehf çî nêzana; labelê wexto ay dewan ra  
yew bi  
meymanî yeno dewa ma, bi nimitikî bo zî ez îne ra tanî xeberan  
gêna.  
Dewicê min û meymanê îne xu rê konê miyanê terraqe; bi seetan  
yewbînî  
dir xeberî danê; behsê pes û dewaran kenê; erd, rez û bexçan ser  
ro qisey  
kenê. vanê qey hema yê xu rê xeberî danê û xeberîdayişê îne beno  
vinî.  
La raşt niyo. Ez şahidê îne wa. Vengo ko fekê îne ra vecêno, di hewa  
de

beno vila û pêl bi pêl reseno min. Ez zî bi enawa kar û xebata îne ra hay-

dar bena.

Şima zanê ez çi ra zehf hez kena? Rebenê Homay, şima go ça ra bizanê!

Baş o, bê ko ez şima aciz bikerî, ez go vacî. Ez govendan û şewbêrkanê îne

ra -ayê ko peyniya payîz û verniya zimistanî de yê- hez kena. Dewicî, hergû şewe di keyeyêke de kom benê û terreqnenê. Vahîrê keyî bi gorey

taqetê xu meymananê xu rê bastêx, meşlûlan, eşkican û fîkiyanê wişkan,

lepikan, dendikanê vaman û gozan di serê sînî de ronano. Eger di şewanê

îne de dengbêjêke zî hazir bo, ay çaxan kêf kêfê min û cematî yo. Bi berzbiyayişê vengê dengbêjî bêvengiyêke xu veradana serê dewe û merdim vano qey yew cîf (nefes) nêgîno û nêdano. Gege ez fikiriyêna

vana, gelo enî dewicî çî rê ende enî dêran ra hez kenê? Eger şima bizanê û

77

DARA GOZÊ

min ra zî vacê ez go zehf kêfweş bibî... Govende. Qet mevacê. La veyveyan weştir çi esto? Wexto ko dewicî heme konê govende; cinî, camerdî, keyney, xort û tûtî heme di raştey govende de bi şayî kêf kenê;

keyney û lacî bi zerêka lertzaya nizdiyê yewbînan benê û dest di destê yew-  
bînan de govende gênê; ez zî bi enî halê xu kona miyanê şayiya îne;  
bi  
pelan û şaxanê xu, di binê hewayêke honikî de pêl dana. Yew weşiya govendan vera yewbînan dêrvatişê grûbanê govendgêran o, yê diyîne zî  
di ereyê şewe de piroyayîşê bilûre wo. Bilûrvan (lulîbend) bi naz luliya xu  
taneka xu ra veceno, hêdî hêdî di miyanê lewanê xu de ca dano serey lulî  
û bêvengiya şewe şikneno; xeberoşkan û meselan bi bilûra xu lûrînenno.  
Wexto ko lulîbend qaydey vergî û kutikî ceneno ti vanê qey hanî yo pêro-  
dayîşê îne di verê çimanê heme goştaritoxan de qewimêno; wexto ko verg  
zorê kutikî beno, lulî bi keder û xem veng vecena; riyê îne ra fam beno ko  
goştaritoxî zî di binê tesîrî de yê; la wexto ko kutik zorê vergî beno, hindî  
lulî girêna; şayî ya, te dir riyê goştaritoxan beno a...  
Ti raşte vacê, eger enî govend û şewbêrkan ra zî nêbo, di qerajê enî koy  
de viyartişê wextî go zehf zehmet bo. Vera vay vakûrî û di binê vewre  
zimistanî de ez bi enî şayî û terraqanê îne bena germ û sebrê zera xu ana.

Ay zî çinêbîne Homa zano go çiqas vîşêr hucrey min bimerdêne.  
Ez bi biyayîşê xu deyndarê ena dewe wa. Sayey dewican de ez esta  
û ci-  
wiyêna. Loma zî ez îne ra zehf hez kena. Seyîn ez hez nêkerî? Kam  
di cay  
min de bo go ana vaco. Ez û ê ma biyê birakî. Çi baş, çi xirab, zehf  
çiyê  
ma kewtê tê miyan, ma di xidareya serdê zimistanan û kelakela  
amnanan  
de piya xu ver ro dawo; di ena dinya de yew nêşkeno ma yewbînan  
ra  
abirno. Ez îne hemine weş şinasnena. Qican ra heta pîlan, pes û  
dewarê  
îne, keyney û lacê îne heme min dir bi awayêke şirîk ê. Vîstikêke  
çinya ko  
ez çîke nêşnawî yan zî nêvînî. Ez hindî şima ra vacî çî? Şima nanîk  
ê zanê  
ma çiqas nizdî yewbînan ê.  
Ez xu erzena vijdanê şima wendoxan û verê vatişan biney ver bi xu  
tadana. Key ra ez etya wa, seyîn min etya ca girot, nîno vîrê min. No  
semed ra min efû bikerê. Şima raşte persê ez zehf biya pîre; zeke  
şima  
zanê, wexto ko merdim beno pîr hindî kes nêşkeno heme çî biyaro  
xu  
vîrî. Beno ko min bi seyan zimistan û amnanî diyê. Ez gege fikirêna;  
ge-  
lo mumkin o merdim heme çiyânê heyatê xu yê verî biyaro xu vîrî?  
Şima

min ra pers kerê, eger bi tamamî nêbo zî çiyê muhîmî lezalez vîrê  
kiçî ra  
nêşinê. Ay çî di kujêke hêşê merdimî de xu danê pêser; bi sebir  
pabey rocê  
xu vindenê. Eger siûdê îne bibo, rocan ra rocêke pêlê geyrayîşî û  
vîrardişî

78

resenê kujê îne û bi awayêkew zerweş yan zî xemgîn îne newe ra  
xuliq-  
nenê. Bi newe ra xuliqnayîşê ay zanayîşanê kanan û ciwiyayeyan  
merdim  
reyna ciwiyêno. Tanî merdimî bi kêfweşî enî çiyen hergû roc anê  
vîrê xu;  
di çarçîbaya mezg û zanayîşî de, tenî bo zî enî çiyen tekrar kenê û  
pê  
hewiya xu anê. Labelê merdim hergû hewe raştê weşî û rindî nîno;  
gege  
bêhemdê merdimî bo zî meseley nêweşî, tahlî xu aver danê û  
merdimî  
dekenê miyanê torra xu. Bi kul û keser merdimî tê şanenê; milûl  
kenê.  
Herçiqas ko merdim wazeno gamêke verêcû te ra xelas bibo zî eno  
karêkew asan niyo. Cuwe ra ez neçar a ko behsê meselanê weşan û  
nêweşan, meselanê zerweşî û xemgînan, tahlî û şîrînan hemine  
bikerî; ma  
heyat bi xu enawa niyo?  
Eger mowsimanê wesar yan zî amnanî ra rocêke rehîrê şima bi enî

cayan bikewo, bêrê min hete, di binê verestiya min de xu derk kerê  
û goşê  
xu bidê min; şima go ay deme qestê min fam bikerê. Raşta zî reyêke  
tenî  
çimê şima biguno min, şima go heme heyatê min di binê qirmîçanê  
riyê  
min de bivînê. Di binê ay qirmîçan de game bi game heyatê min,  
rocê  
min ê viyartey û xatirayê min estê.  
De hela bêrê ez û şima ma kişta yewbînan de roşê; henda ko ez  
bieşkî û  
taqetê min dest bido ez go şima rê tanî xatirayan û meselanê  
dostanê xu  
vacî. La enî çiyane ko ez behs bikerî, zehf rey xu di payîzê heyatê  
merdimî  
de leqnenê. zî nêwazenê bê qeyd û belge bimirê, şêrê. Cuwe ra xu  
tê danê  
û eger bi nuştîş nêbo zî wazenê bi vatiş di zanayîşê tanî merdiman  
de hey-  
atê xu bidê dewamkerdiş û di rêzila vîran de cay xu bigîrê.  
Gelo şima vanê heqê îne çiniyo? Hela min rê vacê, gelo çîke yan yew  
es-  
to ko bi vaştîşê xu, bê ko çîke di pey xu de verdo, serey xu bigîro û  
ena  
dinya ra şêro? Eke şima min ra pers kerê, ez bawer nêkena. Cuwe  
ra her  
çiyê ko esto, semedo ko bieşko heyatê xu bido dewamkerdiş  
timûtim di

xebate de wo. Enî semedan ra heqê xatirayan erd ra heya asîman  
esto ko

yê zî biwazê hergû hewe xu newe bikerê û bêrê vîrê ma.

Pêlê fikiriyayîşî di serey min de bi enî hewayan geyrenê. Erê ti bi  
Hoday kenê, ti vanê se? Enî çî konê serey to, to rê maqûl ê, ti û kêfê  
xu.

Eke ti meraq nêkenê ka ez go vacî se, ti wazenê hema etya, bê ko ti  
rêzêke

tenî zî biwanê wendiş ra fek vera de, mefikiriye. Ti go bieşkê?

Belê, ez heyatê xu û dostanê xu ra şima rê çend nimûneyan û  
xatirayan

vana.

79

DARA GOZÊ

1 - Hûtê Gola Qorqorî

Nizdî se serre verûcû, rocêke rocanê payîzî ra, dewicî di keyeyêkew  
pîl de

ronîşte û di miyanê terraqêka germ de biy. Îne behsê camêrdî, ters,  
cin,

perî û hûtan kerdêne. Ereyê şewe de vatiş hame Hûtê Gola Qorqorî  
ser.

Qalî derg biy; ronîştey şî-hamey û di peynî de va yew nêeftareno bi  
şewe

şêro ûca. Husênî miyanê cematî ra va ez eftarena. Nêeftarenê,  
eftarena,

welhasil îne şert kerd. Dewican va eger ti meşte şan de şêrê serê  
Gola

Qorqorî û şewe ûca bimanê ma go di çiwalan genim bidê to. Husênî  
û  
dewican pê kerd. Ereyê şewe dewicî weriştî vila biy, hergû yew şî kê  
xu.  
Lazim bi ko Husên meşte şan ra heya şefeqî, tenî, di Newala Qorqorî  
de  
di serê gole de bimendêne. Ti raşte vacê Husên poşman bibi û  
tersayne,  
labelê reyêke soz dabi û ser ra zî şert kerdbi. Ciniya yê Zerê, bi  
heyran û  
qurban ci rê lavayî kerde; yê ver ro geyra la fayde nêkerd. Heya  
nimacê  
yerî Husên bi ters û heyecan di dewe de mend. Ver bi şan vişt we,  
tifingê  
xu yo qapsulin girot; di nanê tenûre, di serey piyanzî, tanî tantûr û  
tanî  
sola ko kerdibî miyanê potikêke, pêro kerdî tewrey xu û verê xu şa  
Newala Qorqorî.  
Newale henda çewres deqîqa bi pay dewe ra dûrî bî. Di serê rehîrê  
xu  
de Husênî xu bi xu va verê ko ez şêrî newale, ez go şêrî Yeniyê  
Maran;  
beno ko siûdê min bibo û ez çend zerecan bikişî û şan de di verê  
gole de  
biney şamê min weş bo. Husênî rehîrê xu tada ver bi Yeniyê Maran.  
Rey  
rey ver bi şan semedê aw ra zerecî hameyne yenî ser. Husênî velg  
ra xu rê



kozikêke viraşt û kewt miyanê kozikî, bi hêviya ko zerecan bikişo.  
Badê  
wextêke, refêke zerecan xu di serê yenî de nişt. Husênî tifîngê xu  
girot,  
qundaxê tifîngî weş sîney xu şana, nîşan girot û giştta xu ya destê  
raştî -giş-  
ta şade- di linga tifîngî de şidêna. Gumiya tifîngî ra çend zerecî  
perray û  
çend hebî zî di verê yenî de perpiziyayne. Husên wişt we û ver bi  
zerecanê  
perpiziyayeyan vazda; hîri zerecê gozelî tepiştî. Heme hîri zî sere  
birnay,  
dekerdî tewrey xu û verê xu şa Gola Qorqorî, şî.  
Tarî hêdî hêdî kewtêne erdî ser. Wexto ko Husên resa serê gole,  
hindî  
80

zehf wextê yê nêmendbi. Lezkanî biney percînî, pûş û darê wişkî day  
pês-  
er û di verê gole de cay xu nîşan kerd. Bêsiûdiya yê rê şewêka tarî û  
der-  
mate bî. Merdimî nêşkayne verniya xu bivîno. Husênî biney pûşî,  
heste  
û berheste taneka xu ra vetî; bi destê xu yê çepî pûşî û di kiştê pûşî  
de  
berheste tepişt, hesteyê adirî pêtkanî da berheste ro. Badê ko çend  
rey

heste û berheste pêtkanî gunay pê ro, çiqlikan pûşî girote. Husênî  
ca de  
puf kerd û adir tê vist. Hindî dormarê yê sayey adirî kifş bîne.  
Husênî zerecî tewre ra vetî, ruçiknay; wişt we şî gole ver, zerey  
zerecan  
pak kerd û ageyra; adirî ver de ronîşt. Bi kardî hîrê hebî şivî heway  
şîşan  
semedê pewtişê zerecan ra taştî û pak kerdî. Zerecê xu sole kerdî û  
seme-  
do ko sole weş tehmê xu bido goştî, zerecê bi şîşan wa di kiştâ xu  
de siyan  
ser o nay ro.  
Adir hindî girr bibi. Di verê adirî de ronîşte, bala yê şî kilanê adirî ser  
û  
we kewt miyanê xeyalan. Dinyaya cin û periyân, dinyaya dêw û  
hûtan di  
mezgê Husênî de xuliqiyayne. Xeberoşk û meselay tersî, di verê  
çimanê  
yê de ganî bîne. Tariyê şewe ze kaposêke xu yê ro piştêne; nîzdî yê  
bîne.  
Bêhemdê xu, xu bineyna ver bi adirî ant; adir ci rê bibi paşmêrêke.  
Di ena  
şewa tarî de xu di ena newale de tenî û bêçare his kerdêne. Bala xu  
hina  
zehf da kilanê adirî. Kilanê adirî, di verê çimanê yê de şiklê ciya-ciyay  
girotêne. Ciniya yê Zerê hamî vîrê yê. Gêsê Zerê di verê çimanê yê  
de

bîne berz; bîne derg; bereqiyayne; birû, çimî û lewê ya yê sûrgulî eysayne.

Çimê Husênî ver bi cêr tadiyah; gerdenê ya û sîney ya wo hinarîn eysayne. Husênî bi niyeto ko destê xu çicikanê Zerê ra no, destê xu ver bi

ya berd; la semedê veşayiş û dicnayışê ra, yê destê xu ant û veciniqiya; bi

awayêkew matmende haniya dormarê xu ra. Zege vaco »ez etya se kena,

ka Zerê ko ra şî?« Biney badûcû xu hesiya; sozê yê û dewican û şertê îne

hame vîrê ci. Axiyêka xorîne ante. Çiqas wext şibi yê nêzanayne. Adir sist

bibi. Çend darî eştî adirî ser û pê adir geş kerd. Wişt we şî verê gole, sere

û çimê xu şitî û ageyra hame cay xu.

Semedê pewtişê zerecan, di kiştanê adirî de siy nay ro; kuçike viraşte;

zerecê bi şîşan wa dartî we û kuçike ser nay. Herçiqas yê nêzanayne la

hindî erey bi û şewe nîme bîbî. Şewêke bêvenge. Eke vengê veşayîşê daran

û qurr-qurrê qurrqurrokan ra nêbîne vengêke bînî ena bêvengiya şewe

nêherimnayne.

Gola ko we ver de bî, zehf xorîn û hîra nêbî. Xorîneya gole hirî-çar, hîrayeya ya şeş-hewt û dergeya ya zî henda des metreyan bî. Di miyanê

siyan û zinaran de ze hewzêke eysayne. Tanî awa gole dewanê corînan ra,

81

DARA GOZÊ

pey dereyêke hameyne, qismo bîn zî di binê gole de miyanê zinaran ra ve-

ciyayne. Amnanan wexto ko dere bîne ziwa zî tim aw serê gole ra herekiyayne; ver bi cêr şîne. Amnanan xortî hameyne kewtêne ena gole,

la şewan tersan ver çi kesî nêfterayne rehîrê xu bi enî cayan bifîno... Xura

sebebê şertkerdişê Husênî û dewican zî eno ters bi.

Di a şewa tarî de, wexto ko Husên di gole ver de bi, dewicî zî di keyeyêkew pîl de pabey yê biy. Hinan vatêne mumkin niyo ko Husên

weş ageyro, go ters û cinawirî yê bikişê, tanînî zî vatêne willahî cinawir-

minawirî çiniyê, eger o nêterso, go sax û silamet ageyro û go di çuwalî

genimê xu zî qezenc bikero...

Enka bala Husênî pewjyayişê zerecan ser o bî; la nişka va xumiyêke gole ra hamî, to vatê qey gole kel dana. Dimacû şiklêkew ecêb ze dêwêke gole ra veciya û ver bi adirî hame... Homa merdimî bipawo.

O

çi bobelat bi. Henda hîri metreyan derg, şiklêke zey însanan û pirçin, pirço derg, heşî xirabêr; sere û çimî zî zey yê însanan la yê zî pirçin.

Miyanê çimanê yê nêeysayne, la serê serey yê zey torzînêke bi.  
Husên  
hêz ra kewtbi û nêeşkayne xu têbido. Waştêne werzo, biqîrro; la çi  
heyf  
ko azayanê ganê yê zey waştîşê yê nêkerdêne... Dêwo seretorzînin  
hame  
verê adirî, di qarşî Husênî de ronîşt. Haniyayne Husênî ra. Badê  
wex-  
têke hêşê Husênî hame sere, dest û lingê yê hindî leqayne. Vengê  
xu  
nêkerd. Nêeftarayne vengê xu bikero. Zerecanê vezdinan ra ron  
kewtêne miyanê adirî û veşayne. Husênî bêhemdê xu şivêke tada  
ko  
kişta bîna zerece zî bi pewjiyo. Dêwî zî zey yê kerd. Her reya ko  
Husênî  
şive tadayne, Dêwî zî bêzariya(teqlîdê) yê kerdêne. Husênî şivêke  
girote  
û ronê zerece cilanê xu sawit. Dêwî zî şivêke girote û teqlîdê Husênî  
kerd. Bi enawa, sere ra heya verê lîngan wirdînan zî xu di miyanê  
ronî  
de verda. Husênî nişka va piskoniyêke girot û Dêwî ra na; kile yo  
girot  
û Dêw di miyanê kilan de mend. Bi qîjiyêka ecêbe Dêw orra û rema  
şi,  
di miyanê gole de bi vinî.  
Bi qîjiya Dêwî, Husên tersan ver xereqiyabi. Wexto ko bi xu hesiya  
hindî şefeq bi. Haniya dormarê xu ra, adir tefiyabi û zerecê yê  
veşaybî.

Wişt we, haniya gole ra, haniya dormarê adirî ra, la çîkew fewqalade nêdî.

Şi gole ver, sere û çimê xu şitî; hame fekê tewrî akerd, waşt ko biney nan

û tantûr boro, la nêşka... Herçiqaş ko veyşanbi zî. Wişt we, tifing û tewrey xu girotî û verê xu tada dewe...

Zerê, di keye de bi çimanê bêhewnan pabey mêrdey xu bî. Şiyayîşê mêrdey xu ra heya serê sibay di quncikêke de xu antbi pêser û bi ters û

82

heyecan bermaybî... Bê ko hayiya ya te ra bibo ko mêrdey cay ver bi dewe

yeno.

Şefeqê Homay ra, di xortî, di teberê dewe de, di serê rehîrê Husênî de

pabey yê bî ko piya şêrê keyewo ko dewicî tede pabey Husênî vinderte

biy. Senî ko Husên eysa xortî şî verniya yê, piya rey ra şiy, bêveng.

Xortan

di binê çiman ra zeke merdim hanêno egîdan ra temaşey Husênî kerdêne. Husên di verê çimanê îne de zey dêwêke eysayne û bi heybet rey

ra şîne...

83

DARA GOZÊ

2 - Bro û »dibistane«

Roco yene bi. Ena serra ewlîne bî ko banêke di meheleya corîne de  
bi  
namey »Dibistane« hamebi nawitiş. Banêkew di odeyin bi, wahîrê  
banî  
kê xu berdbi şaristan. Bi yardimê dewican necarêke tanî kursî û  
masey vi-  
raştî; ban hame sîwaxkerdiş û weş nîno vîrê min labelê ez vana qey  
rocêkew dişeme bi, heme dewicî piya bi tûtanê xu, di verê banê  
dibistane  
de kom bî. Yewê serqotî ko tera vatêne »Xoca« qisey kerd û dimacû  
tûtî  
şî zerre û bay îne zî ageyray serê kar û xebata xu.  
Wexto ko »memûrî« şaristan ra hamey û va »ma go di dewe de  
dibis-  
tanêke akerê”, dewicî biney tersay; xu ra di barê îne de edet bi, çiyô  
ko  
tebera, şaristan ra bihameyne tersêke vistêne zerra îne; vayê tersî  
xu îne ro  
piştêne; û heya îne ra hameyne xu ay »xerîban« ra dûrî girotêne.  
Dewican  
ziwan û qisekerdişê nê xerîban ra çîke fam nêkerdêne. Neheq zî  
nêbî,  
hema bi enî halê xu ez zî ay »xerîban« ra aciz bîne. Seyîn nêbî, min  
bi xu  
zî ziwanê îne ra fam nêkerdêne. E verûcû zî çend rey hameybî dewe,  
la  
hameyîş û şiyayîşê îne zehf balê min nêantbi; xu ra di dewe de zehf  
nê-

mendêne; hakerûna xu werdêne û şîne. Semedo ko min zanayne etya nê-

manenê ez ne ziwane îne mûsawa û ne zî min çîkew anayîn fikiryawa.

Cilê îne zî zege dewican nêbî. Ti raşte vacê heya enka dewican çî xêrêke

yê »xerîban« ra nêdîbi. Gege ê -îne ra vatêne esker- bi sîleh hameyne dewe

û tanî xortê dewe pêser kerdêne û berdêne; gege tan bînî zî hameyne

dewican ra zerd û perey waştêne; yew yew rey zî kewtêne kê dewican gen-

im, cew, nîske çî dest bikewtêne berdêne, vatêne semedê eskeran benê.

Brahîm tûtêkew hewtserre bi. zî zey amveranê xu dest bi dibistane kerd bi. Kê bay Brahîmî di mehelaya cêrîne de bi. Wexto ko Brahîm şîne

dibistane hameyne hergû hewe di verê min ra viyartine. Xura verê ko dest

bi dibistane bikero ez û we ma bîbî embazê yewbînan. Enka şima go vacê

seyin ti bi enî emrê xu yê vêşî ti yê dir bî embaz? Baş o, ez zî şima ra perse-

na, gelo kal û pîrî seyin torinanê xu dir benê embaz? Şikir Homay rê ko

Brahîm zey şima nêfikiriya. bêfikirkerdêşêkew derg embaziya min qebûl



kerde û hergû hewe hameyne min hete. We biyayişê xu ra heya bi  
eyro bi

84

çimanê xu yê şîrînan hanyayne min ra. Çi rocêke xirabî an  
nebaşiyêke

min ra nêdî. Wexto ko qic bi, di miyanê qumateke de bi; amnanan  
daya

yê we di binê verestiya min de kerdêne hawn a. Tîrêjanê rocî ra  
pawitişê

yê min rê kêfweşî bî; bi pelanê xu yê xişnan, bi berzbiyayîş û gurriya  
xu

min bi seetan we pawitêne. Hanyayne min ra û min zî ci rê  
xeberoşkê

weşî vatêne. Pê kêfê yê hameyne û hewayne. Eger yewî bidiyne ko  
heweno, vatêne: »Meleketan dir kay keno û heweno.« Xem nêbeno  
meleketî zî min rê xerîbî niyê, biney heqê min îne ser ro esto, la.

Eyro Bro, bay xu û melay dewe şî li xizînan bigeyrê. Melay  
nûşteyêke

nûşt û di miyanê girrêşê de pişt. Waştişê bay xu ser ra Bro bêzerra  
xu şî

dîkê îne wo sipe bi destan tepişt; lingê dîkî girêday û we kerd zerrey  
tewreyêke hîray, la serey dîkî teber ra bi. Îne huwe û kulingêke zî  
xu dir

berdî. Piya ver bi koyê pey dewe şî. Nîm seetê rapey di cayêke de  
ko şikê

xizînan kerdêne dîk tewre ra vet; bi layêke sist nûşte milê dîkî wa  
girêda

û semedo ko dîk nêremo layêkew derg zî lingê dîkî wa girêda û dîk  
vere  
da. Melay vatêne »dîk ça weng do û nikulê xu bido erd ro lazim o  
ûca  
bêro kendiş.« Labelê dîkî çî cayêke de veng nêda. Broy dîkê xu kerd  
veri-  
ka xu û yê ko ro kewtî diyar. Reya ewilî ra di qatî vîşêr şî. Enka di  
serê koy  
de cawo en berz de bî. Vatêne ko verûcû di serê enî koy de qesrêka  
mîrêke  
biya; a qesre di erd zelzeyêke de biya xira. Merdimê ko di qesre  
de bî  
pêro merdê û xizînay Mîrê zî binê xirba qesre de menda.  
Broy rayêka bîne dîkê xu vere da; badê biney geşayîşî, dîkî di cayan  
de  
veng da û nikulê xu da erd ro. Cayê ko dîkî nikulê xu dabi piro Broy  
bi  
qûçan nîşan kerdî. Wexto ko enî çî bî, Mela û bay Broy nimacê  
nîmerocî  
ser o bî. Nimacî ra pey ê hamey û dest bi kendiş kerd û hinda di  
metran  
erd kend bê ko raştê çîke bêrê. Îne cay diyîne zî kend la ew zî veng  
veciya,  
bê xirba siyan çîke nêeysayne.  
Çend cayanê bînan de zî îne dîk vere da la dîkî nêwend. Ver bi şan  
ê bi  
awayêkew rincan û destveng ver bi dewe kewtî rehîr.

Di miyanê dewe de Melay bay Broy ra xatir waşt û şî kê xu; Bro û bay  
xu zî ver bi kê xu hamey. Wexto ko Broy nîzdî min kerde zerweş bi  
û bi  
nimitikî hewayne; ê dîkê xu tewre ra vet û vere da; dîk bi ecele ver  
bi keye  
vazda. Semedo ko çîke nêhame bi serey dîkê yê Bro di kîşte bay xu  
de bi  
kêf bi gamanê xu yê qîcan şî keye.  
A enî hevalê min ê qîcî dest bi dibistane kerdbi. Bi ters û heyecan  
şîne.  
Riyê yê ra kifş bi ko şiyayîşê dibistane ra zêde kêfweş nêbi. Rocêke  
min  
meraq kerd û min tera persa:

85

DARA GOZÊ

— Bro ti seyîn ê?

Bê zerra xu va: Ez baş a, spas.

— Ti wazenê ma xu rê biney qise bikerê?

— Nê, eyro nê.

Min zî we zehf aciz nêkerd. Bro şî keye. Labelê we bêkêf û mirûzê  
yê tirş  
bi.

Badê çend rocan Bro hame min hete la tenî nêbi. Çend hevalê yê yê  
dibistane zî tedir bî. Hamey xu rê bi kap û gozan kay bikerê. Ew roc  
kêfweş bi; qîrrayne, we û hevalê xu hewayne û vazdayne...

Min waşt ko ez te ra persî ka we wazeno ma qisey bikerê, la min xu  
bi  
xu va »Fek tera verra, nanik o embazanê xu dir kay keno, ez go  
semedê çî  
kêfê îne biheremni”. Badê kaykerdişî embazê yê şî keye, we tenî  
mend.  
Hanya min ra û hewa. Zeke vaco »eger ti biwazê ma şikenê qise  
bikerê”.  
Min va »de ka bê”. Hame min hete nişt ro û dest bi ci kerd: »Hevalê  
min  
o erciyaye, ti zanê ko ez to ra zehf hez kena; cuwe ra zî ez to ra çîke  
nêlim-  
nena. Ti zanê ko min zî emsarr dest bi dibistane kerd; eno midetêke  
wo  
ez şina û yena; eke ez raşte vacî kêfê min dibistane rê nîno. Xocay  
ma bi  
ziwanêke qisey keno ko ez te ra çîke famnêkena. Qeyboke ziwanê  
yê û zi-  
wano ko ma qise kenê zey jobînan niyo, wexto ko ez wazena çîke  
vacî zî  
ez nêşkena. Ma eynanê ko emsarr dest bi dibistane kerdo heme bi  
ters û  
matmende -zey kerr û lalan- hanênê fekê Xocay ra. Min reyêke day  
xu ra  
pers kerd, ka çirê Xocay ma zey ma qise nêkeno, ya va »Xoca bi  
ziwanê  
mektebe qisey keno. Bimey sebir bike ti zî go bimûsê”.

"Ti zanê ew roc wexto ko ti min persay ez çirê bêkêf û acizbiyaye biya?  
Ez vacî, ew embazê min o kelawsipî yo ko gama bîne etya bi, ma piya  
kaykerdêne, embazêke min o jêhati yo. Çend rocî verûcû Xocî te ra çîke  
va, labelê yê nêzana vaco çî, cuwe ra bêveng mend. Ay ser ra Xocî zehf da  
piro; qehr û dicayîş ver qasê nîm seetêke berma. Yew embazê min ê bînî  
zî di ay rocî, wexto ma bi nehan û fesûlyan çiyêke Xocî textî ser ro nûştîbî  
viraştêne, nêzana Xocî ra vaco »mîza min yena", nêşka xu tepişo û di  
ortey sinife de binê xu de mîze kerde. Gelo ti bê ti go bêkêf nêbê?"  
Gelo ez eşkayne vacî çî? Bi zîwanêkew bîn di dibistane de qisey kerdiş  
min rê meqûl nêameyne û zey neheqî eysayne. La min zî nêzanayne çirê  
ana wo. Coka zî min nêzanayne ka ez Broy ra vacî çî. Broy min ra bawer  
kerdêne û xu bi xu vatêne »Hevalê min o qedîm heme çî zano;«  
çimkî  
heta enka min hergû hewe cewabê persanê yê dabi. Labelê ez enka kewte-  
biya miyanê tengani. Min his kerdêne ko nêzanayîş cifê merdimî

peysneno; lazim bi ko ez xu bi awayêke bifeletnî. Min efû bikerê  
min zî  
xu li metodê kanî girot; yanî min va »Bro biney sebir bike, wexto ti  
bibê  
pîl ti go cewabê persanê xu bimûsê.« Bi hanyayîşêkew xerîb hanya  
min ra;  
zeke vaco »Ti çirê min ra nêvanê, ka çirê ana wo?»

...

87

DARA GOZÊ

3 - Wesar û eskero siya

Di binê tîrêjanê rocî de, hilmo ko erd ra wirzeno bi boy û mizginiya  
we-  
sarî dekerde wo. Vewre di qerecanê koy de nêmanda, heliyawa. Di  
serê  
koy, cayanê berzan û çalan de, cawo ko zimistanî va û gijoleke  
vewre day-  
bî pêser hema zî sipî kena. Hefteyêke ra pey go ya zî biheliya. Bi  
varte, we-  
sarî, dereyê ko ko ra ver bi cêr yenê bi awa sûre û lîşine benê pirrî;  
erdê  
qerecanê koy û kiştanê dereyan her serra ko şina hîna sist beno; ko  
bi xu  
zî bi emrê xu yê dergî şahidê enî awayî yo. Laserê wesarî ver, gege  
ana  
beno ko pes nêşkeno dere ra bivêro; dewicî bi zehmetî pesî  
viyarnenê; la

hewna zî rey-reyan bizêke yan mêşînêke aw de şina.  
Di peyniya aşma Edare û aşme Nîsane de hindî wesar bi heme  
weşiya  
xu sere hewa dano we û tebîetî bedilneno. Tîrêjê rocî hergû roc hîna  
germ  
benê. Aw koyo bi vewre pişte ewilî cay xu pîneyanê siyayan,  
fistananê  
gewran û qehweyîyan rê verdeno; dimacû hêdî hêdî fistanêkew  
zergûn  
dano xu ra û roc bi roc hîna zergûn beno. Di qeracanê koy de  
pirpizêk,  
pîvok, nêrgiz û gelêka çîçekê bînî mizgîniya wesarî îlan kenê. Di  
destê îne  
de gulçanî tûtî di qeracê koy û miyanê erdan de pîvokan vecenê û  
aynan  
ra tacanê giloveran virazenê; ay tacan bi vilanê rengînan  
xemelnênê. Vaş  
roc bi roc beno derg û bi vilanê rengînan xemelêno. Di binê dewe  
de  
dehlî ver bi asîman berzbiyaye, xu wesarî rê kenê hadre. Di miyanê  
dewe  
de darê tuyan, tuyê şamî, romî û sipey vişkoyênê. Darê sayan,  
biyok, in-  
cas, mişmiş û xoxan bi vilanê xu yê rengînan di miyanê bexçeyan  
de; darê  
vaman û miroyan di dormarê dewe û gege miyanê rezan de, dimacû  
darê

hinaran bi vilanê xu yê sûran kêfweşî û boyweşî peyda kenê,  
rengêkew

ciya ko merdimî mit û mat verdeno, danê wesarî. Ena rey enî vilî di  
wex-

tê wesarî de menzerayêka zey cenetî xuliqnenê. Ti vanê qey tebîetî  
di

musabeqey esteran de semedê xudestviştişê xelata yewine,  
renganê sûr,

zerd, sipî, binevşî, xemrî û pembeyan ra sentezêke nêdiyaye  
xuliqnawo û

bi firçeyê xu yê tebiî ena menzera viraşta.

Mêsê engemînî hanê zimistan ra şiyarbiyaye; semedê xebatêka pîle  
kariyan ra vecênê; ver bi deryayê vilan perrenê û vilan ser o kay  
kenê, doş

88

benê, nişenê ro, cewherê vilan gênê û ver bi kariyanê xu perrenê.

Di zerey

kariyan de qesranê sipiyan virazenê; ay qesrê ko mîmaran ro ca  
teng kenê

û cîf piro peysnsnê, bi sebrêkew zaf hîra sî bi sî yenê viraştiş. Paley  
keyî di

binê emrê kebanî de zerre ra xebetênê û embaranê banî bi cewherê  
vilan

kenê pîrr.

Dewicî di miyanê bostanan, rezan û erdan de, di kar û xebata xu de  
yê.



Hergû yew bi karêke mijûl o. Tanî rezan şelênenê, dormarê mewanê en-gure kenenê, tanîna mêwan pêşenê, tanî zî di miyanê bostanan de cite kenê yan zî dormarê bostanan sinc kenê û birînanê bexçeyan ko zimistan ra mendê derman kenê.

Mirîçikî, koterî û kekûy daran ser ro, zerecî di miyanê leman û binê tehtan de, şalûlî di binê kendalan de, bilbilî di caw berz de miyanê zi-naran de hêlînanê xu virazenê. Şefeqê sibay ra heya şan vengê çûçikan û wendişê bilbilan ra hewa bi melodiyan debeno. Ver bi şan, wexto ko di pey dewe de zinaran ser ro zerecî wanenê merdim heyran û heşmetkar beno. Rez û newalî di binê vengê îne de milûl benê. Ez nêzana şima qe goştariya wendişê zerecan kerdo yan nê? Eger şima nêkerdo lazim o şima wesarêke rehîrê xu etya ro bifînê û goştariya îne bikerê; ay çaxan şima go fam bikerê ka di miyanê tebîetî de ciwiyayîş çî yo.

Di wesarêke anayîn de, şefeqêke, ma çimê xu bi qîrrayîş, hewar û bi lawayîşê kutikan akerdî; ma bî hêşyarî; la vengê kutikan û çekan têk-

ilêyewbînan bibi; badê wextêke kilmî veng kutikan ra biriya.  
Dewicanê  
ko fersend dî bi tersêkew zehf keyanê xu ra veciyay û ver bi newalan  
û zi-  
naran remay; îne di pey zinaran û siyan de xu nimnayne û hanyayne  
dewe ra. Ay ko bi çekan hamey Eskerê Siyay bî. Di dewa ma de  
camêrdî  
kiştî; rehma yîne bi tûtan û ciniyan zî nêamî. Çiyê nêdiyayey ardî  
serey  
ciniyan û keynanê ma. Ez şerm kena behsê ay çiyay bikerî. Gelêke  
cinî û  
keynay semedo ko nêkewî destê ay bêînsafan xu zinaran ra eşt û  
merdî.  
Ay bêînsafan banê dewe weşnay, pes û dewarî berdî. Merdimê ko  
destê Eskerê Siyay ra feletiyay bi koyan kewtî. Veyşan, perîşan bi  
hefteyan koyan ra mendî. Bextê îne rê wesar hamebi, hindî dinya  
germ bî  
û tar zehf bi; bi xêrê ay tarrî (pincarrî) ra ê merg ra feletiyay; di  
xûrîneye  
newalan û zerrey şikeftan de mendî. Badê ko eskerî mintîqa ra şî,  
yê  
ageyray dewa xu. La dewe nêmendebî. Dewicê ko weş mendîbî  
newe ra  
dewa xu awan kerde. Şikir Homay rê, ma nanik ê piya yê û di erdê  
xu ser  
o yê.  
Raştiko min nêwaştêne bi meselayêka anayîne menzarayê wesarê  
89

## DARA GOZÊ

mintîqey ma xira bikerî. La destê min ra çi yeno? Ez behs nêkerî  
nêbeno.

Herçiqas meselayêka nêweş û tehl a û merdim nêwazeno biyaro xu  
vîr zî,

la eno çî qewmiyawo; loma zî lazimo bêro vatiş. Eskeranê Siyayan  
çirê

ena dewe û gelêke dewê bînî veyşnay û sebeb çi bi, Eskerê Siyay  
kamê? Bi

raştî ena mesela zehf derga! Xura zeke min verûcû zî vatbi, min cay  
xu ena

dewe de giroto; qaso ko ez di serê erdî de eysena hende zî di binê  
erdî de

wa. Ez nêeşkena şîrî bigeyrî, heme çî bimûsî. Ez tenê dormarê dewa  
xu û

mintîqey xu ra weş haydar a. Ax ax, xêrê Hoday rê di hergû ca de,  
di her

dewe û mntîqa de heyatê verûcû û enkay bihameyne vatiş û nuştîş  
ko pê

hemderdê min bivirazyayne û barê min pê şenik bibibayne.

90

4 - Hezkerdiş, rindî û zilm

Eyro zî Dîkê Kê Hecî Silêmanê Şaşikçewtî hame û min ver ro derbas  
bi;

şi miyanê erdê xu. Şima go vacê eno çi yo, ma we bira dîk o, yan ti  
ana

vanê?

Belê, verû ko ez Dîkî bidî naskerdiş, lazim o ez bi Şaşikçewtiya Hecî Silêmanî dest pa bikerî. Di dewa ma de çend hecî bi namey Silêmanî bî;

û dewican îne hergû yewî rê leqamêke peyda kerd bi. Ena rey verê ko

Hecî şaşike çewt bido serey xu ser, hergû hewe weş şaşêke girêdayne û bi

usûlêkew weş nayne serey xu ser. Wexta ko rocêke Çawîşê qereqole di

miyanê dewe de geyrayne û di verê dikanê Ristemî de -dewicî gege ûca

kom bîne- dewican ra va »ez nêzana, eno bi çend serrî ko Serekkomarê

ma yê nêmerdey înqîlab kerd û cil û belgî bedelnay. Ka min rê vacê şima

çîrê hema zî enî şaşikan û kelan danê serey xu ser? Erdîşa xu zege bizan

veredanê?» Hecî waşt vaco ko di barê îne de edet o, wexta ko ê benê kalî

şaşike an kela danê serey xu ser, la hema vatişê Hecî nêqedyabi Çawîşî

şaşike Hecî serey ê ra ante û eşte erd... Hecî vengê xu nêkerd. Şaşika xu

erd ra darte we. Badê ko Çawîş şî, Hecî şaşika xu na serey xu ser la ena rey

rast nêkerde; şaşike serey Hecî ser o ver bi destê rastî çewt bî; cuwe ra wex-

ta Hecî di cemaet de hazir nêbayne dewican tera vatine  
»şaşikçewt”.

Sebro û Fatê yewbînan ra bi zere û gan hez kerd. Welew ko Fatê  
ciniya

viyaye bî zî, Sebro goş nêda dewican; zey xu û bi zera xu kerd. Verê  
ko ê

bizeweciyê, dewican yarî kerdêne, vatêne:

— Erê ti bi Homay kerê Sebro, ka vace to çi di ya viyay de diyo ko ti  
ana aşiq biyê, aqil di serey to de nêmendo, semedê qotêke cinî  
wexta ti

bikewê çolan...

Sebro hewayne, destê xu berdêne serê serey xu, kelay xu dartêne  
we û

vatêne:

— Ha şima rê, ena kelay min reyêke tenê bidê serey xu ser û bi  
çimanê

min banîrê Fate ra, şima go bivînê ka ya seyîn a. Bi Homay, bi Homay  
ne

ena dewe de ne zî cayêkew bîn de yewa zey Fate ne esta ne zî bena.

Hema

xu qet aciz mekerê. Fatê yew tenya wa, tenya...

91

DARA GOZÊ

Sebro xortêkew êtîm û feqîr bi. Wexto Sebro des sere bi,  
zimistanêke

hewrês kewt banê îne ser û kê îne di binê vewre de mend; heya  
dewican

ê binê vewre ra vetî da û bay ê merdî. Dewican Sebro merg ra feletna. Di dewe de Sebro ewil şî golikan ver û dimacû şîwaneyî kerde. Badê ko bi pîl hindî di miyanê erdanê xu de kar kardêne. Erdîşsipeyanê dewe rocêke qerar da û va lazim o ma Fatê û Sebroy bizewecnê. Dewican hergû yewî bi gorê taqetê xu îne rê yardim kerd; veyveyê îne viraşt û »aşîqê dewe« ay namdarî resnay yewbînan. Hezkerdişê Fate û Sebroy badê zewacî zî kemî nêbi. Sebroy ciniya xu ra zehf hez kerdêne û tim ya rê yardim kerdêne û nêverdayne ya karêkew giran bikero. Eh, de ena rey şîma vacê ma di dewe de di halêkew anayîn de merdim fekê dewican ra feletêno? kê Hecî Silêmanê şaşîkçewtî zî çend kergî û dîkêke îne bî. Di dormarê banî de, di serê sergoy de wexto ko yê xu rê qut geyrayne, yê dîkî eger çîke bidîne hema nikulê xu dayne erd ro û bîne tix tixe yê, baskê xu erd ra kaş kerdêne; xu nepexnayne, veyndayne kergan; ew wer nêwerdêne dayne kergan. Cuwe ra zî wexta yew dewic bi ciniye xu wa girêdaye û merdey ciniya xu bibayne, dewican eno name nayne pa: Dîkê Kê Hecî Silêmanê

şaşikçewtî.

Dewican di binê verestiya min de semedê ronîştîşî sekû viraşta. Kalê meheleya nîzdî min yenê di serê sekûyan de nişenê ro û xu rê sohbet kenê.

Bê kalan yew yew rey Mela Ehmed û feqiyê xu hameyne di binê verestiya min de munaqêşe kerdêne an zî dersê xu di binê verestiya min de

wendêne. Wendişê îne bi ziwanêkew xerîb, yanê bi erebî û bi ziwanê de-

wa ma bi. Erebi mûsayne la dersê xu bi ziwano ko ez tera hez kena şerh

kerdêne. Xeyrê kitabânê dînî îne kitabê bînî zî wendêne. Mesela şîrê

Melay Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî wendêne. Kîtabê Ehmedê

Xanî »Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê« û her rey ko hameyne qismêke

»Mem û Zîne« zî wendêne. Ez zî kewta miyanê meraqî, min vatêne, Homawo Ti rehîrê îne etya ra fînê, ez bizanî ka çi bi serey Mem û Zîne

hame.

Di miyanê feqiyânê Melay de yew xortêke bi namey Dilşadî bi.

Xortêkew derg û çeleng bi. Vengê yê zehf weş bi. Wexta ko bi vengê xu

yê weşî Mem û Zîne wendêne zera merdimî heliyayne. Gege zera min zîz

bîne, yew yew rey zî hêrs û heybetî ez girotêne. Labelê roco ko Dilşadî

qismê şewa zîfafa Tajdîn û Stî wende, ez bi asîman kewta; di erşê  
alay de  
geyrawa; perrawa... Min zere û gan ra waşt ko ez di cay îne de  
bayne. Min  
92

vatêne, were bi ay aşiqan, were bi hezkerdişê îne...  
Dilşad kewtbi newyes serriya xu. Serêke bî ko yo tenê nêbi. Binefşe  
key-  
nay Mela Ehmedî dir zeweciyabi. Wendişê xu rewra qedêna bi. Eger  
semedê melayî bişîne dewêka bîne da û bay ê tenê mendêne; loma  
yê  
nêwaşt ko ê tenî bimanê, cuwe ra di barê îne de mend. Di dewa xu  
de, di  
serê erd û rezanê xu de weş-xirab go îdarey xu bikerdêne.  
Emsarr rezê îne baş bî; hinî mewî di binê giraniya weşanê engure  
de  
bibî çewtî. Ver bi şan bi, hindî germayiya tîja rocî şikyaybî.  
Binefşe di dewe de ay keynanê rindan ra yewe bî. Ya û Dilşadî  
wirdînan  
zî yewbînan ra hez kerdbi û zeweciyay bî. Enka ya û Dişad di miyanê  
rezê  
xu yê binê Zinarê Hingan de geyrayne. Enî zinarî çara eno name  
giroto  
û zinarêkew seyî no? Belê, zey çiyane bînan meselay namey enî  
zinarî zî  
esta. Mevacê ke ser û binê ê heme zinarêke wo. Eno çî meqûl niyo,  
coka



ez mecbûr a ez vacî ko eno zinar zinarêkew edetî niyo. Teyrê ko wazenê  
leyrekanê xu nefes ra bipawê şinê di nîmey enî zinarî de hêlînê xu vi-  
razenê. Zinarêke, zinarêkew berz. Ti des bananê ena dewa ma bidê pêser  
qasê yê berz nêbenê. Eno zinar seyîn ûca bi ca biyo û ana zeke bêro çik-  
nayîş weriştîo lingan ser, Homa zano. Amnanêke wexta mêsanê engemînî  
şitil daynê, yê şitlan ra yew qefleyî şa rêbere xu dima, dewe ra veciyay, şî  
di nîmey yê zinarî de, di qulikêka zey kariyan de ca girot. Yê rocî ra nata  
namey yê zinarî bi Zinarê Hingan.  
Di kiştîa yewbînan de, di miyanê rêzanê mewan de geh bîne vinî, geh  
serey îne eysayne; şiyayîş de gege hêtê îne ginayne pêro û Dilşadî nermeya  
hêtê Binefşe di ganê xu de his kerdêne. Yew yew rey bi hanyayîşêkew  
nerm û germ hanyayne yewbînan ra û reyra şîne. Binefşe kesekêke herî  
qelebya; fek û rî ser kewte war; la semedo ko erdê miyanê rezî nerm bi ya  
nêdeciya û bi hewayîş va »ay”. Di binê fistanê ya yê amnanî de qorikê ya

bewlû bî; Dilşadî waşt ko ya werizno, la bêhemdê yê hanyayîşê yê  
şi serê  
hêtanê ya. Di a vîstike de wexta ko ya di binê çiman ra hanya, dî ko  
o  
hanênê hêtanê ya ra, bi niyetê xu qelebnayîşî ya bi awayêkew nerm  
biney-  
na zî hêtê xu berz kerdî; bi enî livyayîşê ya ra hêtê ya bineyna bîne  
eysay,  
fistanê ya di miyanê şeqanê hêtanê ya de hînke bi ca bibi. Ya xu  
qelebna  
û destê xu ver bi yê wa derg kerd; bi antêşêkew nerm ê fikrê ya fam  
kerd;  
di binê mewanê engure de îne yewbînan gevezna... Bi gazkerdiş û  
lewan  
îne di ganê yewbînan de deqê sûrî mor kerdî. Geh cêr û geh cor ra  
îne cilê  
yewbînan şelênay; di binê mewanê engure de bi pelanê mewan  
piştêbî.  
di cenet de zey ê di merdimanê verînan bî...

93

## DARA GOZÊ

Di binê mewêka engura siyay de, bi zerêka pîrr hezkerdiş hanyayne  
yewbînan ra; ê weşeyêke engura siyay ra çend hebî tera kerdî; -di  
miyanê  
lewanê ya de ronayne û îne bi lewanê sûrgulan hezkerdişê xu pare  
kerdêne;- çimê yê tadiyah çala gerdenê ya ser; ê çend hebê bînî  
weşe ra

tera kerdî û di serê kortika gerdanê ya de di miyanê giştanê xu de  
pelez-  
nay; çilkê engure kewtêne çalike gerdenê ya; peleznayîşê çend  
gilliyên di-  
ma kortike bî pirr û dalpeyêke ver bi acêr kewt rehîr; di miyanê di  
koyan  
ro newale de şî, hame resa naka ya, »Yeniyê Qestelî»; ûca bêtaqetî  
ra sere  
na ro. Dilşad jî bi hanyayîşê xu çilke dir şîne; o zî hame serê »Yeniyê  
Qestelî« vindert; serey xu ver bi yenî nizim kerd; bi zîwan û lewanê  
xu yê  
teyşanan awe yenî ya rengşerabe ziwa kerde û rehîrê peyay verûcû  
ver bi  
cor ramit; ya di binê yê de bi çîmanê xu yê nîmakerdan yê  
karexezalan  
perrayne; pêlanê hezkerdişî di binê zîwanê yê de zey laserêke ya  
şanayne  
tê. O resa çalike gerdenê û a awa rengmeyî peysna...  
Wexta ko beryay cenetî di verê yê de bi weşî nîşanê xuakerdişî da,  
espar  
bê teredut dekewt zere; di cenet de, ê yewrey bi yewbînan ro sûr  
bî; gan û  
rih bî yew; yewbînan ra dûrî kewtî; reyna bî yew; reyna... Xu di serê  
deryay de di gemiyêka hanî de dîne; wexta ko gemî pêlanê deryay  
ver  
bêçareyî û bêmecalî ra, ver bi qerax şî û lenger eşt binê deryay,  
hindî rêwî

mest bîbî. Midetêke di binê mewa engure de, ê hanyay tîrêjanê rocî  
ra, ko  
miyanê pelan ra herekiyayne û rengêkew sûr dayne erd û mewanê  
rezî.  
Roc ver bi awan şîne; dûrî ra zey lengeriyêka adirî eysayne.  
Awankerdox  
rindî û hezkerdişê îne ver bi kêfweşî di asîmanê hewtine de  
hewayne...  
Payîz wextê çînayîşê engure û serê reza bi. Enî des rocî bî ko Dilşad  
û  
Binevşe reza de meşxul bî. A serre engure zaf bî; îne di lînî şîre  
kerd  
bastêx, yew kerd dims û yew zî aqît; lînêke zî kerd kesme û lepikî.  
Dirikan ra beranî, şivê vamêran, çend fikiyê beyan û miroyan day  
esîde  
ro û verê tîce de nay ro ko bibê wişkî. Nîmlênêke semedê meşlûlanê  
sûran  
viraşte; meşlûlê gozan dayne esîde ro û îne ko midetêke xu girotêne  
rey-  
na dayne esîde ro; enawa hîri çar rey tekrar kerdêne, heya ko  
meşlûlan xu  
weş girotêne û bîne goştin. Nîmlênêke şîre zî semedê meşlûlanê  
sipeyan  
ard keye.  
Semedê çalmî darê çalmî viraştêne; dare belelûke ra çend şivî tera  
kerdêne û taştêne; dergiye şivan henda metreyêke bî; serê şivan zî  
tera

kerdêne labelê çiqîlê serê şivan pa verdayne û çend şivî dayne pêser  
û girê  
dayne. Helîre xu viraştêne û semedo ko rengê helîre ver bi sipeyî  
bibo  
hînke do verdayne miyanê helîre; dimacû ko helîre peyşa verdanê  
teştêke,  
94

bi ay şivanê belelûkan daynê piro heta ko ya reng bedelnena bena  
sipey û  
kef dana. Badêcû zey meşlûlanê sûran meşlûlanê xu çend rey danê  
esîde  
ro û danê verê tice.  
Di dewa ma de dewicî karê xu ra pey bi awayêkew rincan badê  
nimacê  
eşay konê ra. Ena rey zî îne ana kerd. Kundêke hame û di dare tuye  
şamî  
ra nişt. Bi çimanê xu yê biloqan hanyayne tariyê şewe ra.  
Eno şefeq zey şefeqanê bînan bi roşin nêame; xu dir esker û  
cendirmeyê  
cil zergûnî ardî. çend seetî verê şefeqî hamey û di dorê dewe de cay  
xu  
girot. Serê şefeqî eskeran venda muxtarê dewe û muxtarî ra va  
»devican ra  
vace wa pêro di verê qereqole de kom bibê. Emrê qumandari yo...”  
Qereqole di hetê rochelâtî de di banêkew yewqat de bî, o zî qeracê  
koy

ra bî, di kişta qereqole de, di destê rastî de kaşêkew veng bi telê û  
siyanê  
bereqnayan bi. Semedo ko kaş nizdî qereqole bi, dewicî zêde ver bi  
uca  
nêşîne.

\*

Sebro û Fatê şanê Homay ra di verê mengeney titûnî de ronîşte  
demetê  
titûnî hazir kerdêne. Serê sibay go Sebro bişîne şaristan. Fatê ra va  
»hema  
piyasey titûnî nêbiyo a, eger ez enka titûn berî û biroşî go  
pereyêkew baş  
bikewo destê min.« Titûn pel bi pel kerdêne pak, damarî tera  
antêne û  
kerdêne demet.

Îne davîst cema titûn kerd pak. Sebroy her raye çar cemey titûn  
dek-  
erdêne kozikê mengeni. Raşt a karê titûn û mengenekerdîşê cê  
mesalayê-  
ka derg a. De ka titûnê qutiye dikandarê Çarşiyê Veyşnayî wa şima  
rê

mesalay xu vaco:

”Toximê min wesarî di serê erdêkew zibilin de yeno eştîş. Badê ko  
ez ze  
şitil bena pîl, min bi kok ra ancenê û benê di miyanê bostanan û  
erdan de  
nanê ro. Badê çend efar û awdayîşan lemê min benê pîlî. Di hetê  
binî ra

wexta ko deqê zerdî ginenê pelanê min ro hînî wext o ko min tera  
bikerê  
û semedê araqnayîşî berê di keye de bikerê binê çarşefan ko ez weş  
reng  
bedelnî, bibî zerd. Dimacû min bi layan an şerîtan ra kenê û semedê  
vişkkerdişî danê vera tîcî. Wexta ko ez bena vişk min di cayêkew  
hutin de  
nanê ro; heya payîzî ez weş bena nerm û a çaxî bi gorê renganê min  
ê be-  
delnayeyan min yewbînan ra ciya ciya demet kenê. Enka zî ez  
semedê  
mengenekerdişî di verê karde Sebroy de wa. Yo ko min mengene  
keno  
eger yewo jêhatî bo ez zey porê keynanê kejan bena zerd û derg.  
Min ze-  
hf rayan şinawito ko tanî merdiman vato, »merdim wazeno ko enî  
titûnî  
boro.« Eger ez rehîrê şaristanî ra destê cendiman ra û di şaristan de  
zî

95

DARA GOZÊ

destê qolçiyar ra xilas bibî, ez di Çarşiya Veyşnayî de yena rotiş...  
Ena ray  
dikandaro erînayox, ti vanê qey ê bi xu ez xuliqnawa; bi qutiye xu  
min  
taneka xu ra veceno û dano embazanê xu...”

Dewicî ne bi vengê melay ne zî bi vengê dîkan şiyar bî di ay şefeqî  
de;  
bekçiyê dewe banan ser o geyrayne û fermane qumandarî bi vengê  
xu yê  
hewninî dewican rê eşkera kerdêne. Dewicê ko serê sibay rew şîne  
erdanê  
xu ser, karê xu ser û ay ko hayiya îne ferman ra çinîbî; an zî waştêne  
xu di  
teberê dewe de bilimnê, bi destê eskeranê ko dormarê dewe  
girotbi  
hameyne tepîştîş û komkerdiş; peynî de heme xort û camêrdê  
dewe, bi  
weşî an zor verê qereqole de kom bî.  
Sebro cendirman reyre û di serê polê yê de mengene û çuwalêke  
titûn  
ver bi qereqole hameyne. Cendirman we raşteraşt berd barê  
qumandarê  
xu. Qumandarî bi şiva destê xu mengene mocna û va »eno çi yo?«  
Sebroy  
va »eno mengeney titûn werdîkerdişî yo.« Di verê qereqole de, di  
verê çi-  
manê heminan de qumandarî biney titûn bi Sebroy da werdîkerdiş.  
Dimacû qumandarî dî ko raşt o, îşaretê yê ser ra cendirman bi  
nuskidayîş  
û paskilan Sebro zî berd miyanê dewicanê bînan.  
Qumandar hame û dewican ver de vindert û gefî vendî va »şima ra  
yewî



emşo tîfîng banê Çawîşî ra nawo. Ka vacê şîma kamî ana kerdo?  
Eger şî-  
ma nêvacê ez go ana bikerî ko şîma poşman bibê ko şîma day xu ra  
biyê.«  
Wit dewican ra nêveciya. Heme zey telebanê mektebe rêz bîbî.  
Qumandar, di dest de şîvêka barî, dewican ver ro şîne hameyne.  
Bêvengiya dewican ew yewrey hêrs kerdêne û ê bi şîva xu dayne  
binê  
çeney dewican ro, persê xu tekrar kerdêne.  
Dewicî bêveng bî... Qumandarî emir da eskeranê xu, va: »Xu rê  
çîwanê  
başan peyda bikerê û enî heran ra kewtan biney talîm bikerê.«  
Eskeran  
hewşanê nîzdî qereqole ra çîway zîxmî ardî û bi emrê »marş"î verê  
dewican şa ay kaşê kiştî qereqole. Dewicî vazdayne û eskeran zî  
pey ra,  
nêvatêne sere wo, paştî ya û mil o, dayne îne ro. Dilşad û çend  
merdi-  
manê bînan ê ko waşt qise bikerê an zî qarşî zîlmî bêrê, hemine  
zêdetir  
kutiş û derbî werdî. Eskeran her rey rêzêke dewicî dayne verniye xu  
û ê  
»talîm« kerdêne. Wexta ko tanî eskerî bîne rincan tanî bînan cay  
îne  
girotêne. Serê sibay ra heya wextê nimacê teştî dewicê ko di verê  
Qereqole de kutiş nêwerd nêmend... Wexta ko eskerî dewe ra şî  
bêvengiyêka bi dec û nefret xu dewe ro pişt...  
Dilşad zî di miyan de, zehf tenî bi rocan, tanî zî bi hefteyan di miyanê

nivînan de mendî...

96

Epîlog - Gozêre

Ez hema zî etya wa; di dewa xu de di serê erdê xu de wa; min bi  
kokê xu

di binê dewe de ristim dawo; ez di serê erdê de bi hêz û heybet a. Bi  
kanki-

lanê xu weşiya zera tûtan a. Bi heme dec, jan, weşî û nêweşiyane  
xu ez etya

wa. Bi emr a, kal biya. Dostanê min yê dewicanê ena dewe ra zehf  
şî

rehmet. Torinê îne, torinê torinanê îne hamey û şî; zilm bi îne bi;  
veyşan

mendî, pêlê zilmê îne ro wiştî we; adir û tofanan xu li bananê îne  
pişt. Bi

koyan kewtî, di şikeftan de, di dol û newalan de mendî...

Destê yewbînan girot û hamey; reyna kişta min de ronîştî; bi kul û  
ked-

er axî antî... Nêzana reye çendine banê xu newe ra viraştî; bi  
destanê xu

yê terkayeyan sî nay sîyan ser, heyatêkew newe na ro; toximê  
heyatêkew

newe ramit... 06.06.1995

97

DARA GOZÊ

\*\*

DARA HINARÊ

Yaşar Kemal

Roman

Wergera ji tirkî: /Ferat Çewerî

NÛDEM

Weşanên NODEM 37

Dara Hinarê

Stockholm: 1998

© Kurdiya wê Weşanên Nûdem

Pergala bergê û rûpelan NÛDEM

Wêneya bergê: Bişar îsa

Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri

ISBN: 91 88591-37 5

Adres:

Nûdem Box 177

177 23 Jarfilla-Sweden

Tel û Fax: 8-580 131 62, 8-583 564 68

ÇENDGOTIN

Min ev romana ha di sala 1986an de bi navê Dr. Poloço wergerandibij

kurdî. Paşê gava me di destpêka salên 90î de dest bi weşandina kovara Nûdemê kir, me di du hejmarên Nûdemê de; di hejmarên 2 û 4an de beşê pêşî ji romanê weşand. Hingj kêfa xwendcvanan jê re hatibû û wan xwestibû ku em hemû romanê li dû hev biweşînin. Lêbelê, hcr ku çû hcjmara nivîskarên kovara Nûdemê zêderir bûn û loma hcr ku çû cih jî di Niademê de tengtir bû. Ji berdcla weşandina romanê, me maqûltir dît ku em cih bidin nivîskarên nû û em bêtir bcrhemên nivîskarên zimanê kurdî biweşînin. Ji ber vê scbebê cv romana ha wilo ma. Ji ber ku

min ew bi destan wergerandibû û ji bcr pîrbûna kar, min di xwe re nedidît ku ez wê derbasî komputerê bikim. Lê gava di sala 1996an de min Yaşar Kemal li Stockholmê dît û soza çapkirina pirtûkê dayê, êdî ji min re bû barek ii min xwe mecbûr dît ku ez wê derbasî komputerê bikim û mîna pirtûk çap bikim. Mîna tê zanîn min bere bi nave Dr. Poloço hem werdigerand hem jî dinivîsand.

Lê min niha dev ji nave Dr. Poloço berdaye û ez bi tene navê Firat Cewerî bi kar tînim.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...

FiratCewerî

Stockholm, 1998

6

Jina Memed li deşta bê ser û bin li ser lingan rawestiyabû. Dû re ew daqûl bû û wê bi destan erd veda. Piştî demekê, çend tov dîtin. Wê ew tov di nav destên xwe de birin û anîn. Paşê xistin nav diranên xwe û dawiyê xistin bêrika xwe.

Wê dû re xwe bi xwe got:

- Wey li min be, wey li belengaziya min be. Hemû jî riziyan e. Wey li min bc.

Ew dîsan bi destan li nav axê geriya, wê çend tovên din jî dîtin. Ew jî xistin nava diranên xwe. Paşê bi hêrs tifikir, avêt ûgot:

-Wey, weey keda min.

Di nava erd de tu hêşinayî tune bû. Ji serî heta binî erdekî rût dixuya.

- Em ê bimirin, wê got. Em ê îsal bimirin... Wey, wey ii serê min ê bi derd be.

Dû re ew rûnişt û bû qomik. Li wê deşta bê dawî dinihêrî, li wî erdê mirî dinihêrî. Ji êşê serê wê kirî biteqiya. Carê di nav re jî digot:

- Axx, ax keda min.

Ew heta danê êvarî nikarîbû ji cihê ku rûniştibû rabûya ser xwe.

Di cihê xwe de sar mabû. Wê wilo li ber xwe dida, ku te digot qey wextî ruliê wê were standin. Dû re ew rabû ser xwe û kete re. Roj çûbû ava. Ew hat malê, békêf û bi dilkulî li ber kuçik rûnişt.

Memed:

- Keçê, got, çi bûye?

Jina wî bi hêrs got:

- Here. Here Çûkûrovayê, tovên ku me avêtine hemû riziyane.

Em ê heta deh rojan çi bixwin? Zad hemû riziyane.

Xwê nemaye. Em ji arvên buhurîn xwê nemaye.

Di nava xênî de du kehrikan bi hev re dileyistin. Çar zarokên bi kincên pertalî li hev civiyabûn, bêî ku bipeyivin, ew wilo li ser lingan rawestiyabûn. Tenê yê herî biçûk, bi kirasê xwe yê qetiyayî, bi fişefiş lîka xwe dikişand.

Memed:

- Em ê bizina belek bifiroşin, em ê ji xwe re kêsek genim bikin û dawiya maye jî em ê ji xwe re pe xwê bikin.

Jinikê:

- Bifiroşe, got. Bifiroşe da em ji wî panye qetix ji bibin.

Memed: u i

- Gava ez ji Çûkûrovayê ve gerim ez ê du heban bikirim, ez ê çar heban bikirim.

Jinik:

- Bikire, got. Bikire! Bifiroşe da em hişk bibin.

Memed hêrs bû:

- Ez ê bifiroşim! got. Hem jî ez ê bi xweşikahê bifiroşim.

Jinik:

- Bifiroşe, got. Bifiroşe! Bifiroşe da em bimirin.

Dotira rojê Memed bizin firot Dûre Efendiyê ji gunê

hember. I i i jWeke

ku mirî ji malê derbikeve. Jinik ji bo bizma belek di

ber xwe de bi îskînê digiriya. Memed jî nikaribû bihata malê.

Wî nikaribû li riîyê jina xwe binihêriya. Ji ber vê yekê, ew

her li derve digeriya.

Bayekî sivik zibilên bizinan ber bi dîwaran ve dibir. Ji wê

de Memed hat. Dû re jî Husik. Li ber dîwarê xaniyekî rûniş-

tin. Li ser Çûkûrovayc peyivîn. Ew ê sibehê zû têketina rê û

biçûna.

Husik:

- Derewan dikin, got. Çawa kar li Çûkûrovayê tune?

Ew Çiikûrovaya mezin!

Memed:

- Derewa dikin, bi hêrs got. Derew. Ew karkeran nabînin,

ji bêkarkerê dimirin li Çûkûrovayê.

- Derew, derew... Tenê ku mirov bigihîje Çûkûrovayê.

Niha li Çûkûrovayc weke segan li ber mirov digerin.

Piştî kurtedemekê Êsiv hat. Hcrduyan bi hev re :

- Hat, gotin.

Êsiv berî ku rûnê:

- Min bihîst, got. Min bihîst ku hûn diçin Çûkûrovayê.

Min bihîst ku...

Husik:

- Em diçin, got. Ez, Mmcd û Aşik Alî em ê herin.

Osiv:

- Tuh, got. Aqilê we. Hûn diçin mirinê, hûn diçin nexwe-  
şiyê. Hiîn diçin tayê, hûn diçin ziqûmê. Aqilê we. Ev Çûkû-  
rova ye!

Hûn Çûkûrovayê ji min bipirsin. Ez bi Çûkûrovayê dizanim.  
Dêhnino! ji birçîna bimirin û dîsan jî neçin! Ji xortaniya  
we re heyf e. Bira Memed, yê te çar zarokên te wek çar  
gulan li dû te hene. Vê yeka han meke. Yê ku diçin venage-  
rin, ku vcdigerin jî weke min bi nexweşî vedigerin.

Memed:

-Tu çara wê tune ye, got.

Husik:

- Em dizanin, kcko, lê çarc tuncye, got.

Osiv:

- Yê ku bi Çûkûrovayê dizanin, dizanin. Ez bi Çûkûrovayê  
dizanim.

Dişewite. Awekc wê heyc weke xwînê yc. Her mêşeke wê  
weke gurckî birçî ye... Wcke cwr bi ser mirov de digirin û  
xwîna laşê mirov hemijyî dimêjin. Dişewite kcko, dişewite...  
Werin, vê mekin. Li rewşa min binihêrin. Min bidin ber çavan.  
Wcrin, vê mekin. Ava wê pîs e, gemarî ye, weke xwînê  
ye... Werin hcvano!

Gotinên min peyvên hevaltiyê ne, şîreta bavan e. Li rewşa  
min binihêrin, birçî bimirin, dîsan jî meçin. Ji birçîna bimirin  
dîsan...

Kar hcyc, perc hcye, nan heyc, şîrê çûkan jî heye; tu çi bbcwazî heyc, lê mirin jî heyc. Pcrîşanî û belengazî jî heye. Ta jî heyc, êşa zirav jî hcye. Li rewşa min binihêrin... Çûkûrova dişewite, dişcwitc... Hegcr hûn bi ya min bikin hûn naçin.

Husik:

- Çara wê tuncye, cm bimirin jî dîsan em ê herin.

Memed:

- Em ê biçin.

Husik:

- Mirin ji feqîriyê çêtir e. Ta ji belengaziyê çêtir e. Êşa zirav ji tunetiyê çêtir e.

Memcd:

IO

-Em ê biçin, got.

Osiv:

- Li rewşa min binihêrin, got. Ez naçim.

Heger ez careke din biçim, wê li wir meytê min bimîne.

Ez carckc din naçim. Ez ê pcl û qajilên daran bixwim, lê ez naçim.

Memcd:

- Em ê biçin, got.

Husik:

- Mirin ji hejariyê çêtir e. Em ê hcrin.

Osiv:

- Li rcwşa min binihêrin.

Wî bi dcstê xwe yê rastê hcr zikê xwe nîşanî wan dida. Zikê wî weke zikê jineke avis werimî bû. Stûyê wî weke şivekê zirav, lèvên wî yên qalind qelişî û perçivîbûn û di rûyê wî de



piça xwînê nçma bû.

Scr û binê wî pçrîşan bûbîi. Pçhniyên lingên wî yên xwas perçivîbûn, bûbûn wekc lastîkên otomobîlan.

Husik:

- Mirin hçye veçer tuncye, got.

Osiv:

- Ya min şîrçta hcvaltîyê çc, got. Her mêşeke wê...

Husik:

-Tu bi Xwedê bikî bes e Osiv, got.

Osiv careke din dcvê xwe venekir.

Lihêfên wan ên pînekirî li piştên wan bûn. Dasên xwe jî xistibûn ber piştên xwe û li bendî Memed rawestiyabûn.

Memed bi jina xwe re dipeyvî. Dû re:

- Di xweşiyê de bimîne, wî got û meşiya.

Jina wî bi dû wî re:

II

- Zad hemii riziyaye, got.

Roj bilind dibû. Ew dcreng mabîin. Ketin rê. Ta ku axa sipî ya xaniyên gund ji bçr çavên wan winda bûn jî, ew li pişt xwe dizîvirîn û li gund dinihêrîn.

Ew wisan dimçşyan, ku ax di binê lingên wan de diherifî.

Dengek ji pişt wan hat. Ew rawestiyan. Dîtin ku Osiv bi bazdan bi dû wan dc tê. Heta ku Osiv gihîşt ba wan çw ji hal de ketibû, bêhna wî diçikiya.

Osiv:

- De rawestin, got. Ez hçbekî bêhna xwe bçrdim. Ez ji gund heta vir bi bazdanê hatime.

Li Osiv civiyan. Piştî Osiv hebekî bêhna xwe bçrda ij bi ser

hişê xwe dc hat, got:

- Ez fikirîm, ez hizirîm, cz bi dii wc de hatim. Kurdan gotiye, mirin mirin e, ev xirxira han çi yc!? Mirin mirin e...

Bimçşin.

Asman çikî sayî bij. Ew deşta dûz di bin lingên wan dc diherifî.

Dema ku cw di kêlcka crdan rc derbas bûn, daqûl bûn û dcstên xwe li nav erdê gcrandin.

-Xer tê dc tuneyc, wan gotin. Çênabe...

Mcmmed:

- Ku xêr tê de hebe jî ji çi re dibe. Bostck e. Biçinc, biçinc dest namînc, ncynûk namîne. Zadê jê tê jî du kulm in. Ma ku xêr tê de hebc ji çi re ye?

Husik:

- Bila tunc be, got.

AşikAlî:

- Ku hcbûya baş dibû, got. Ji qet nebûnê çêtir e.

Osiv:

iz

- Bila Çûkûrova têkeve binê erdê, got.

Ên din kcniyan.

Ew gihîşin Akpinarê. Li wir rûniştin û bêhna xwc berdan.

Av vexwarin, scr çavê xwe şuştin. Bi carekê ve lê nihêrîn ku ew ji xwe re çi bibînin, şivanê Keklikoglu Memedê Zarok di ber wan de derket.

Husik:

-Xêr e, Mcmedo, got. Tu li van deran çi digerî?

Memedê Zarok:

- Ez diherim, got. Ez ê herim Çûkûrovayê. Min çûyina

we bihîstibû, ev du rojên min in, ku ez li vir, li benda we me. Ez ê biçim, êdî.

Bila êdî Axa ji xwe re şivanekî wekc min bibîne. Min xistiye scrê xwe, êdî ez biçim.

Mcmmedê Zarok zeyif, weke şivekê bîi, lê dest û lingên wî mczin bûn.

AşikAlî:

- Tc baş kir Mcmed, got. Min bihîstiye nebihîstiye, tu li ber dciriyê Kcklikogiu yî.

Husik:

- Ne hcq, ne tu tişt, nc wisan e?

Memedê zarok:

- Ez mirim, got, ez ji canê xwe aciz bûme.

Husik:

- Her roj jî lêdan...

AşikAlî:

-Tu ê rizgar bibî, got.

Memedê Zarok:

- Ma ew ê li Çûkûrovayê mafê min bidin min?

AşikAlî:

13

- Çûkûrova jî ya Keklioglu ye, got.

Husik:

- Hela hela, got.

Mcmcdê Zarok:

- Mafê min, got.

Memedê din:

- Mctirse, got.

Mcmcdê Zarok:

- Ez ê cotek gayê quloçmezin bikirim, got.

Osiv:

- Çûkûrova di bin erdê keve, got.

Aşik Alî:

- Paş ve vegerc!

Osiv:

- Çavên sedemê kor bibc, got.

Mcmmedê Mezin, yanî Memcdê din:

- Xwişkcke min hcyê, got. Layiqî Çûkûrovayê ye. Kcko, ez çi dibim bila bibim, lê xwişka min layiqî Çûkûrovayê ye. Xwişka min wisan ji min hez dike ku... Em ê rast hcrin çcwlikê (çîflikê) Xwişk di scr xwişka min rc li Çûkûrovayê tunenc, Em ê heta payizê li çewlikê bbcebitin.

Meşyan, şevckê li Çûkirovayê razan. Ji wir ketin rê:

- Gund di ser gundên Çûkûrovayê re tunene, gotin. Ew yckemîn gund in, ku ji xcrîban hez dikin.

Ew di riya dûz re meşyan, bi ser serkêş ketin, daketin bin scrkêş. Li scr zinarekî rûniştin û nan û çolika xwe xwarin.

Bêhna zcnbûrê ya xweş ew dêhn kirin. Paşê wan xwe dirêj kirin û cigarên xwe kişandin. Ew ji Mazgaçê derbas bûn.

Daristan dbcuşxuşîn. Li ser girê Çîçekê çadirên koçeran dît-  
tin. Ji çadiran dûxan pêl dibû. Keçikên pêşmalsor dew diki-

14

landin. Li Sigrîngaçê li hemberî wan kurdekî pêxwas û serqot, digel jina xwc lî pênc zarokên xwe kerek di bcr wan de bû û dihatin.

Jina yê kurd û her pênc zarokên wî wisan zeyif bûn, ku te

pif bikira wan cw ê biketana. Li wan tu tişt nemabû. Te digot qey ev çil salên wan in ew di xelayê dc ne. Silav da wan û derbas bûn.

Bi kurtebiriya gotinê, piştî rêvççûna du rojan ew gihîştin Çûkûrovayê. Ava Savrûnê bi xuşîn diherikî, zela...

- Li jorî Dîkîrlînê, li bin darekê çavên xwe nerm kirin.

Gava ew hişyar bûn, roj ber bi ava diçû.

Memedê Zarok çavlbccw, bêdcng hêdî-hêdî çû ba Memedê din. Dcvê xwe bir ber guliê wî û hêdî:

-Apê Memcd, got. Li vir mafê min naxwin ne?

Mcmcd:

- Metirse, got.

Memedê Zarok bi kêfgot:

- Tu bi rastî dibêjî? Ma ew ê li vir mafê min bi temamî bidin min?

Memcd:

- Ez ji te re dibêjim, mctirse, got.

Memedê Zarok:

- Ez ê cotek ga bikirim, got, cotek gayên quloçmezin. Ez ê pir bixebitim.

Memed:

- Ez ê te emanetî xwcha xwe bikim. Tu ê ji xwe re kar bikî.

Memedê Zarok:

- Mafê min... got.

Memed:

15

- Metirse, got. Li vî welatî di ser xweha min re timcye.

Wan lihêfên xwc avêtin piştên xwe. Aşik Alî tembûra xwe

ya serî bi gulî xist destê xwc.

Mcmed:

- Çiftlik li vê jêrê ye, got. Em ê niha bigihênê. Ku xwişka min me bibînc cw ê ji kêfan bifire. Ew ê li zarokan bipirse. Wê çcnd sal bcrê du kirasên nikenû dabûn jina min. Koroxliya me hê jî wan kirasan li xwc dikc. Ku em niha bigihên wir ew ê mc bifcirmînc hundir. Ew ê karê herî baş bidc mc. Em ê heta payizê bbcebitin.

Husik:

- Xwehên wcnî li Çûkûrovayê nayên dîtin.

Mcmed:

- Gcr axa rojê yckê bide xclqê, ew ê rojê yek û nivê pê bide dayîn. Ji bo wc jî dê bibêjc, ev hevalên Mcmed in.

AjikAlî:

- Xwedê bike wisan be.

Memed:

- Jinên weke xweha min nînin. Hûn ê niha bibînin. Çe; ku cm bigihîjin wir ew ê nênc dcrxîne.

Mcmcdê Zarok:

- Mafê min...

Mcmed:

- Metirsc.

Memcdê Zarok:

- Ên quloçmczin...

Memcd:

- Ez bi qurbana xweha xwe bim. Ger ceger bi axê re hebe, bila mafê kesî bixwe. Xweha min ê derkeve hemberî wî û bibêjc, ji Xwedê bitirse, ma mafê van belengazan tê xwarin?...

i6

:r

Hingê dê axa bi lez dcrbbce û bide.

AşikAlî:

- Heger weha be divê mirov xwe ji xwehên wisan te bike bi qurban.

Memcdê Zarok:

- Yên qidoçmezin...

Husik:

- Ez ê quloçên mezin di diya te kim, got. Quloç, quloç!

Memed:

- Dev ji lêwik berde, Husik, got. Wî xwe dîtiye nedîtiye ew li ber deriyên xelqê ye.

Aşik Alî:

- Dest lêwik medin, got.

Memcdê Zarok:

- Ez ê pir bixcbitim, got.

Mcmcd:

- Cotek gayên mezin hcbûn, got, min wck çavên xwe li wan dinihêrî. Xweha min digot, di nav karkeran de yê ku wek te li gayan miqatcyc tuneyc. Xweha min weha digot. Gava ez ji wir hatibûm, gayê min ê zer giriyabû.

AşikAlî:

- Hela, hcla, got, hela Memed!

Memed:

- Heger ez derewan dikim, ez xêrê ji zarokên xwe nebînim. Gava cz hatim wî stûyê xwe xwar kir û xwe alast. Hûn ê niha bibînin. Ku gayê zer min bibîne ew ê min nas bike.

Ew ê ji kêfa di cihê xwe de bileyize û biûre. Hûn ê niha bibî-  
nin.

AşikAlî:

-Xwedê bike wisan be, got.

17

Memcd:

-Tcw jî xweha min, got. Em ê bi saya serê wê bi hêsanî  
peran qezenc bikin.

Mcmedê Zarok:

- Ez ê ji xwe rc cotek ga bikirim, got, cotek gayên ku ji  
min hez bikin.

Husik:

-Tu ê bikirî, got, tu ê bikirî...

Aşik Alî:

- Dest lêwik mede, Husik, got. Roj nedîtine hîn, çenikek  
zarokc...

Husik:

-Em dcstê nadinê...

Memed:

- Zikên karkcran sal donzdch mch bi şorba mirmirkê dinepixin.

Xweha min nanê bi goşt û rûn dide min. Xweha  
min evqasî ji min hcz dike.

Ew ketin hundirê çewlikê. Hewşa çewlikê tije traktor, zadçin  
(bîçer), crcbeyên hespan, kamyon û jîpên hêşîn, sor û  
zer bûn. Di bin tava rojê de dişewitîn. Masey-Harris û Ferguson,  
makînen bi markeyên cûrbicûr... Çcnd pcyayên  
kinçboyax bi tebatî li dora wan makîneyan diçûn û dihatin.

Memed:



-Wa yc xweha min, got û mcşiya.

Şelwerckî reş li xwcha wî bû û cmir dida nanpêjên tcnûrê.

Xweha wî yeka qûnmczin û dagirtî bû. Ji cnîşka wê heta bi bazinê destên wê tijî bazinên zêr bûn.

Memed ber bi wê çû, çû ba wê, tu nemabû ku ew li hev biqelibiyana. Xweha wî hîç guh nedayê. Memed şaş û ecêbmayî mabû, hîna jî dikeniya. Hcrçar hevalên wî li wir rawcsi8 tiyabûn, geh li Mcmed, geh jî li xweha wî dinihêrîn.

Memed xwc negirt:

- Xwişkê, got, ez Mcmed im...

Jinikê cw wisan raçav kir.

Mcmed:

- Xwişkê, got, ez Mcmed im, Memedê pale... Ma nayê bîra te ku min bi gayê zer cot fikir. Em harine paleyiyê xwijkê, ez Memed im.

Jinikê serê xwe hilda, li wî nenihêrî û zivirî ser pîrekên nanpêj.

- Nanekî bidin cvc han, bila hcre, got. Jineke nanpêj nanck dirêjî Memed kir, ew nan wisan di destê Mcmed de ma.

Wck te satiick ava sar bi ser da kiribe, xwîna di laşê wî de ziwa bû. Rûyê wî reş û zer bû.

Bi hêdîka:

- Xwişkê, got, xwişkê, ez Memcd im. Mcmedê Pale. Gayên zer. Ma naycn bîra tc, gava ez çûbûm wan stûyê xwe zivirandin...

Gayên zer li ku ne?

Xwişkê bê ku lê binihcra, pişta xwe dayê û ber bi malê ve meşiya.

Mcmed ji vê cccba han tiştck fêmh nckir, bi gêjî nan di

dcstê dc û li hcvalên xwe zîvirî.

Hevalên wî tu tişt jê re nçgotin, lê dû rc Aşik Alî:

- Guh mcdiyê, Memcd, got. Vir Çûkûrova ye. Ne ku em nizanin. Guh mcdiyê. Xwezî te bikarîba gayên xwe yên zer bidîtana. Kî zanc bê wê bclngazan çiqasî kêficweş bibûna. Ew çûn aliyê çiftlikc yê din, pişta xwe spartin dîwêr û rûnişrin. Husik girs bû, bi qasî du peyan bû. Aşik Alî zeyifokî, Memed dirêj bû.

Gava lawikekî bi tilûmê bi yax û qetiyayî di ber wan re

19

derbas bû, çavên wî li Mcmed ketin. Lawik bcr bi wan vc reviya.

-Hooo apê Memed, tu bir xêr hatiyî, tu bi xêr û silamet hatiyî, got û çû destê wî.

Lawik hijdch salî xuya dikir.

Min wer bêriya tc kiribû, wer bêriya te kiribû, ma tu li ku ma yî? Tu du sal bcrê çûbûyî ne wisa?

Min wer bêriya tc kiribî, min xwe bi xwe digot, ew li ku be ê rojekê derkcve îi wcre. Tu bi xêr hatî, tu bi xêr hatî. Lawik kirî ji kêfa bifiriya. Pir şikir apê Mcmed, pir şikir ku min tu dîtî. Min digot, çawan be tu ê rojekê wcrî, a va ye tu hatî.

Mcmed:

-Hela rîinc, got.

Lawik rûnişt.

Mcmcd:

- Zcro, tc bihîst bê xweha min çi anî scrê min? Min qct bawcr nedikir ku dê xweha min weha be. Min ev ji diya xwe dipa, lê min ji xwcha xwe ncdipa. Gava pale bi xwarina şorba mirmirkê zikê wan dincpbcî, xweha min nanê bi riln îi

goşt dida min. Serê xwe hcjand. Min ev hêvî nedikir. Min di xcwna xwc de bidîta, min ê bawcr nckira. Ev çi ecêb e? Ez şaş mame, Zero!

Zero:

- Mepirsc apê Memed, mepirse, got.

Tiştê ku li vir dibin tu bibihîzî wê devê te ji hev bimîne.

Xwişkê ne xwişka bcrê yc. Bi tenê ez li çcwlikê mame. Tu kcs nemayc. Xwişkê yên din hemû qewirandine.

Memcd:

-Min bawer nekir, got. Min bawer nedikir...

Zero:

2,0

-Xwişkê hate dizîn, got. Dibêjin ku ew bi dildariya reş ketiye.

Memed:

- Çiii?

Zero:

- Çirka ku ev motor hatine, ew evîndar bîiye. Motoran ew dizîne. Dil keriye motoran...

Memed:

-Wey li minê! got.

Zero:

Her sibeh, hcma ku ji xew radibe, radihêje satilek av û qalibek sabîin, diçe scr motoran îi tcker îi motorên wan dişon îi wan paqij dike. Ku ew piçek herî îi toz li wan dibîne, ew dêhn dibc. Ew her rojên Xwedê wan dişo. Dibêjin ku dilê wê ketiye ririmpêlan.

Mcmcd:

- Wcy xwchinga min, got.

Aşik Alî:

- Zor e, got. Xwcdê ncyine serê tu kcsî. Evîndarî zehmet e.

Zero:

- Ji roja ku tirimpêl hatine, cw nabêjc ne zivistan e, ne pîk e, li ba şofêr siwar dibe û diçe nav zeviyan. Ew her rojên Xwedê wisan dikc.

Memed:

- Wê ez nas nekirim, got. Wey xwişka min a belengaz.

Qey wcha ye ha! Ji evîndariya ku tê gotin zortir e. Wey belengazê!...

Zero:

- Ne dêhn e, got, ew dîsan weke berê ye. Ew evîndar bû-  
ye, çawa te nas nake?

zi

Mcmcd:

- Min bawer ncdikir. Ev qet nedihat bîra min. Wisan be,  
hişê wê li serê wê ye, lê cvîndariya rcş... Xwedê şifa xwe lê bike...

2^ro:

-Tiştên li vir dibin tu bibihîzî! Rojê hezar pale tèn û hezar  
diçin. Pale wcke lavlakê ne. Kar tuneye, hal time... Xwişkê jî  
şaş maye. Arvan têt nakc, nan têt nake. Tenê bide, bidc.

AjikAlî:

-Wisan ha!

Zcro li Mcmcd zîvirî:

- Ger haya te ji tiştê ku dibe çêbibe, tu ê hingî fêhm bikî...

Welî axayê kal, Dûrsiinê Kût...

Memed:

- Çi bi Welî Axayê kal hatiye? got.

Zero:

- Qet mepirsc, got. Tiştê bi serê wî de hatiyc, qet mepirse.

Mcmcd:

- Rîiyê wî bi nîir bîi, got. Kar jî dikir, mirov digot qcy cw xortekî bîst salî yc.

Zero:

- Çû, got. Hcmîi çîin, bi tcnê ez mame. Li Welî v^xayê kal mcpirse...

Memed:

-Min di mcreqê dc mchêle. De ka bibêje bê çi bi wî hatiye?

Apê Memed, got. Gava ev tirimpêl hatin, axê em hemîi qewirandin. Hemîi vekişyan îi çîin. Welî deiket hemberî axê îi got, axa, ji Xwedê bitirse, ev çil û pênc salên min in.

zz

ku ez li bcr dcryê te mc.

Ji Xwcdê bitirsc, axa, min riha xwc li ber vî deriyî spî kiriye.

Piştta min, li ber vî deriyî tewiyaye. Ez ê pişrî vî emirî bi ku de herim. Ez ê çi karî bikim? Di vê goristanê de jina min radizê, diya min radizê, sê zarokên min radizên. Axa, wê Xwcdê kcviran bi ser te de bibarîne. Vê zilmê meke. Axayê gawir, min tu di hembêza xwe dc mezin kir, min tu lorand îi mezin kir... Hîn gîiyê te di nava ncynîikên min de ye.

Ez ê piştî vî emirî bi ku de herim? I^, apê Memed, wî wisan got. Giriya, gazin kir, xcbr da, li ber geriya, du rojan li ser vî kevirî riinişt, riya xwe rişikand, nifir kirin. Nedibîi, ew ket rê îi çîi. Kes nizanc bê ew çîiye ku.

Mcmcd:

- Çi peyayekî baş bîi, got. Lê Dîirsîinê Kîit?

Zero:

- Ew niha di hcpsê de ye. Ew bîiye hepsî.

Memcd:

- Hela li Kûto binihêrin, kuro, got, mirov qet bawer nedikir.

Zero:

-Axê hcmîi palc dane hcv, êdî ji we re kar nemaye, got.

Oxira we ya xêrê be, got. Hemû çîin. Kûto jî çîi. Mehek du meh di navberê de dcrbas bîi, me dît ku serê tirimpêla Massey-Harris tune. Serê wê jê kiribîin îi biribîin.

Tirimpêla mezin mir. Wcke dêhnan li axê haribii. Çîi hukûmetê, çîi ba walî, çîi Ankarayê. Dii re Kîito li cihekî goribii, min weha îi weha kiriye. Hukîimetê ew girt, lêxist, ew dane elektrîkê. Kûto gotibû, ji ber ku axê ew birçî hiştiye, wî ji înadaxê re wisan kiriyc. Goribîi, oxx, min tola xwe hilanî. Wî serê makîne jê kiribîi îi avêribîi cîhê Anavarzayê yê

23

herî kiir. Goribû, êdî cz bimirim jî ne xcma min e....

Niha cw di hepsa Edenê de ye. Axa geriya negeriya serê tirimpêlê nedît.

Tirimpêla Masscy-Harris mir.

Memed:

- Çi li ba xelqê hcyê, got. Kiito qet nedipeyivî, tim difikî-rî...

Zcro:

- Hcmîi çîin, bi tenê ez mame. Ez ê jî biçîima, lê hostê got, cv ji kar rc dibe. Ez ê bibim şofêr. Ez li ba hostê dbcebitim.

Mcmcd:

- Gayên zer, got.

Zero:

- Axê ga hemîi firotin. Gayê te yê zer ii gayê mor jê kirin.  
Ev makîne heye ya, ev makîna mczin, jê rc dibêjin, zadçin,  
roja ku axê ew aniye gayê zcr ii gayê mor li ber tekcrên wê  
serjêkirin, jê re kirin qurban. Xwîna wan di bin tekerên wê  
dc herikandin. Lê, gayê zcr ji makînê re kire qurban...  
Mcmcd fikirî îi di cihê xwe de sar ma.

Zero:

- Ev hcyê ya, cw hcm diçine, hcm dukutç, hem jê dbce çewalan  
îi didc destên tc.

Edî kar nema. Rojê hczar pale tèn îi hczar diçin. Dilê mirov  
bi rewşa wan pcrçe-perçe dibe... Dilê hostê jê bi wan di-  
şewite...Van ririmf)êlan hcmiiyan bişikîne, bişewitîne, dibê-  
je, herc ba Kîito... Dilê hostayê me pir bi rewşa van paleyan  
dişewite.

AşikAlî:

- Peyayekî baş biiye, got. Kî be ew ê ji dewlemendan hez  
M

bike. Divê mirov ji bclcngazan hez bike.

Zero ji cihê xwe pekiya;

- Hiin niha birçî ne, ez hcrim ji we re xwarinê bînim. Pişti  
kurtcdcmekê Z^ro digel qîişxanek şorbe îi heft:-heşt nanên  
somin vejeriya.

- Ku Darendî li vir bîiya min ê ji we re helaw bianiya, lê  
ew ne li vir e.

- Spas, wekc ku te anîbe, gotin.

Piştî ku wan nanên xwe xwarin, derketin derveyî çewlikê.

Lihêfên xwe kirin wek behlîfan ii razan.

Adinê rojê, sibehê zii dîsan Zero şorbe îî nan anî.

- Af)ê Memcd, got. Hosteyê me pcyayekî baş e. Ez li ber wî geriyam da karckî bidc wc, lê kar tunebii.

Mcmcd:

- Spas, çawan be em ê ji xwe rc karekî bibîn.

Zcro stîiyê xwe xwar kir.

- Xwedê bikc, got.

Rojê wcke komck bizot, tîrêjên xwc berda herçar alî îî spîsor dcrkct.

Di rê de kamyonên bi bar, traktorên ku erebeyên naylonî avêtibiin dû xwe, erebeyên hcspan, zadçin, jîp, otomobîlên axê, yên modelên dawî ku dibiriqîn, bi refan paleyên stîixwar derbas dibîin. Heta niha humc guma ku li Çîikirovayê nchatibîi dîtin der îî dor dagirt. Hey ii hîiyck ecêb hebii. Siyên wan ên dirêj di pêşiya wan de dimeşyan ii ser û binê wan di tozê dc mabîin. Li milê rastê, jinek riinixumandî dîrin. Jinekc wekc miriyckê, parsiiyê wê ketibiin hev îî di nav wê zeviya piçîik de hêdî - hêdî dizîvirî. Ne sîwanek hebîi, ne jî holikek.

Ewrekî ji tozê li hcwa çêbîibii. Ew di nav toz îî dîixanê de

\*S

dimeşyan. Toza ku dida gîzoka wan, lingê wan dişewitand.

Ew hêrs biin, hcr yckî di tcnga xwc de xeber dan. Her ku diçii Osiv bêhaltir dibîi.

Çilkiirova di bin crdê kcvc, gotin.

Siyên wan kişiyabiin binê lingên wan. Tî bîibîin. Di havîna Çîikirovayê dc av ji ku hatiye? Zimanê wan bi ezmanê devê wan vc zeliqî bîi. Bi hêviya ku ew ê avê bibînin, meşyan.



Li wan deran nc gimd hcbiin, ne jî tu tişt...

Bi rcfan pale di bcr wan re derbas dibîin, bi kcdcr, wcsriyayî, mchfbîiyî, stiixwar, dcstên wan li ser newqên wan, ji tozê tenê çavên wan dbcuyîn, diranên wan dibiriqîn. Bi gcpên xwe yên kortbîiyî, goreyên ncqışandî ii qctiyayî li wan, peyayên ku ji piştên wan xwêdan diherikîn... Silav dan û silav girtin.

Roja li ezmên, mêjyên wan dikcland, cw mehû kiribim. Ji aliyekî tîbîin, ji aliyekî westandin, ji aliyekî ve jî acizbîin.

Ji dîir ve, ji aliyê dengê zadçinê ê wî alî, cotkarck dîtin.

7\şik Alî:

- Haydên, got, cm herin wir. Heger av bi wî rc hcbc cw ê bidc me. Pê li pûşc ku zadçinê diavêt vî alî ii wî aliyê kirin îi derbas bîin. Ji roja ku li pirêzê ii qirşikan dbcist, mirov nikaribîi çavên xwe vcbikira. Wan nikarîbiin çavên xwc vekirana ii binihêrîna. Wan ji diir vc silav dan.

Mêrik, jina xwe îi digcl herdu keçên xwc yên donzdch salî hespên xwc spartibîin ber piş îi piş bar dikirin. Scr çavên wan di tozê de mabîin. Mêrik gomlcgê xwe ji xwe kiribîi îi bi tevgerck xurt piş davêt, jin îi zarokên wî jî ew piş bi cih dikirin. Hcspan serê xwe xistibiin nava pûş û kirtekirta wan bû piş dixwarin. Mêrik mclêva xwe ji destê xwe avêt ser pOiş x6

ii hat ba wan. Pirça sînga wî ya dirêj spî biibîi, damarên destên wî nepbcî biin. Wî bi pišta dcstê xwe xwêdana ser çavên xwe paqij kir.

AşikAlî:

- Em tî btine, got.

Mêrik ji kîpê di erebê dc satilek av dagirt. Bi lez, bê ku bîhna xwe berdî av vexwarin.

Aşik Alî:

- Em şewitîn, got. Em şewitîn, lê em neçîin ba vanên ku tirimpêlan dajon îi mc av ji wan nexwest. Ev mifövên ha bi min ecêb tîn.

Bi çavekî piçîik li mirov dinihêrin.

Mêrik:

- Kcrcm bikin, rîinin, got.

Aşik Alî:

- Bi gora miriyan, got.

Husik:

- Navê te bi xêr?

Mêrik:

- Navê min Xelîl e, got.

Hûsik:

- Ev Aşik Alî ye, ev Mcmed e, ev jî Memed e, ev Êsiv e û ez jî Husik im.

Mêrik:

- Kar timeye, got.

Aşik Alî:

- Em nîi harine, em li kar digerin, got.

Memed:

- Maşalê em karekî bibînin.

Mêrik:

»7

- Êdî ji mc re nan ncmaye.

Aşik Alî:

- Ez şaş mame, got.

Mêrik:

- Axê xebcr şandiye, gotiye, bcs e ev li ser pişta min dijîn.  
Gotiye, ev sî sal in, ku ew van erdên min weke malên bavê  
xwe dajon. Gotiye, bila êdî ji nav erdên min derkevin,  
Axê goriye, bes e êdî ya ku ez ji destên wan dikişînim. Ji  
me re nema diqede, divê mirov kêsek kevir bi stiyê xwe ve  
girê bide îî xwe bavêje avê. Jê pê vc tu rê nemaye.

AjikAlî:

- Ev tiştckî ccêb e, got.

Mêrik:

- Ev sî salên min in, ku cz vî crdî dajom. Di hcr bostck vî  
erdî de golek xwêdana min hcye. Min digot, ê wisan here.  
Min digot, qey em ê her û her karibin erdê axê ji xwe rc deman  
bigirin. Min mala xwc xerab kir ii wisan bawer dikir. Ji  
xwekuştin li xwebidardckirinê pê ve tu çareya min nemaye.

Ezilm e...

Aşik Alî:

- Nc zilm c, mirin e, got.

Mêrik:

- Mirin e, got. Ji mirinê jî xerabtir e. Ew ê sibehê motora  
sor bînc bbce nava erd... Di her bostekê de golck xwêdana  
min hcye.

AşikAlî:

- Rast e, got. Ji mirinê jî xerabrîr e.

Mêrik:

-Ez ê ji niha îî pê ve bikarim çi karî bikim?

Ez ê bêyî erd bikaribim çi karî bikim. Zilm e. Yê we dî-

xS

san zad ncqedc jî, erdên we hene, cih îî warên wan hene...

AşikAlî:

- Heye, got.

Husik:

-Xwezî tuncbîiya, got.

AşikAlî:

-Wa mebêje, heye, got.

Mêrik:

- Bila yê min jî maleke ku min serê xwe têxistayê ii pariyek erdê min hebîiya, bila ez ji birçîna bimirama. Ax, ku yê min jî... Niha ez ê çi bikim? Ax, ev gawirê Amerîkayê, ax, ev muhendîzê marçşal... Zilm e...

AşikAlî:

- Gava deriyck tê girtin, yekî din vedibe...

Mêrik:

- Bila venci, got.

AşikAJî:

- Çawan be wê vebe.

Mêrik:

- Dcriyên ku vcbin ncmanc, hemî harine girtin.

AşikAlî:

-Wê vebe.

Mêrik:

- Gava hîin di vir re harin we dît. Jinekek heye, bi tena serê xwe cot dike.

AşikAlî:

- Me dît.

Mêrik:

-Berî niha bi sê salan lingê mêrê wê di ber patoza axê de ma. Jinik bi sê zarokên xwe ve li vê deştê ma. Zarokên bi ta-

19

yê, zarokên bi êşa zirav... Axê ji wan rc jî gotiye, ji nav erdê min derkcvin. De bila Xwedê deriyekî vekc... Ma deriyên ku bêne vekirin mane?

AşikAlî:

- Ez çî zanim, got, Xwedê gewriya ku qul kiriye vala nahêle.

Mêrik:

- Bila vala bihêle, got.

Husik:

-Wer vala dihêle ku...

Zarokên ku li ber siya tclîz razabiin, giriyan.

Mêrik:

- Keçê, got, werin bîskê bîhna xwe berdin.

Jinikê îî herdu keçikên xwe melêvên xwe danîn îî hatin ba wan. Rîiyê keçikan wek bizotên êgir sor biibiin. Pişrî ku têr av vcxwarin, hatin îî rîiniştin. Jinikê rahişt zaroka xwe, piştê xwe da wan ii pêsrîra xwe xist devê wê.

AşikAlî:

- Rabin zarokno, got, em alîkariya hevêl bikin.

Ji bilî Osiv hemîî rabîin. Di hundirê saetekê dc hemîî piîşê gidîşê avêtin îî hatin li binê holikê riiniştin.

Mêrik:

- Xwedê kêmaniya wc nede birano, got. Jinikê jî ji meşka

ku bi mirdiyaqê holikê ve bi dardekirî bii dew derxist îî dawerivand.

Gişan vexwarin. Gava ji hev veqetiyên mêrik:

- Hiin kêmaniyê nebînin, got. Maşalê hîin ji xwe re karekî bibînin.

Piştî ku ji mêrik veqetiyên bi saetekê bii. Roj diçii ava, lê dîsan jî der îî dor di nava germê de vedigevizand. Li kêleka 30

rê dareke tîiyê ya bi cmir, ku pelên wê ji tozê spî bîibîin, hebii.

Li bcr siya wê darê jî, traktorek bi erebeke naylon ya ku di tozê de mabîi, sckinî bii. Li ba traktorê tu kcs tuncbîi. Ew hatin li hcm bcr traktorê sekinîn.

Husik nêzîkî motorê bii, ku dcstê xwe pê bike, lê Aşik Alî:

- Meke Husik, got. Nêzîk mebe. Çi dibe çî nabe!

Husik xwe bi paş dc vekişand.

Demekc dirêj ew wilo li dora traktorê çiin û hatin ii li her derê wê nihcrîn.

Memedê Zarok:

- Binêrin, binêrin, got. Çavên wê yên mezin jî hene. Binêrin, çawa dibiriqin!

Husik:

- Bila tunebûna, got.

Aşik Alî bi hêrs:

- Bikevc ii bimirc, got. Tiiif..

Wî dcvê xwc tije xwezî kir ii avêt motora bi toz. Tifa wî riyek sor vekir û heya bi jêr hcrikî.

Osiv:

- Çiiktlova di bin erdê kevc, motor di bin erdê kevin, got.

Tiiif..

Memedê zarok hebckî ji motorê bi diir ket, li paş xwe zîvirî  
îi got:

- Mîrat, mîrar, însalch tu ê bimirî. Tiiif..

Tifa Mmcdê Zarok ncgihîşt traktorê.

Ji hcemberî wan zilamekî bi şelwcrê heya bi çongan qetiyayî  
ii perîtî dihat. Mêrik xwas bii. Wî destmalek kevin li serê  
xwe gerandibû îi di bin wê lihêfa li piştê, piştta wî tewiya bîi.  
Gava ku wî pê li erdê fikir, te digot qey ew pê li sêleke sincirî  
dikc, taviê lingê xwe ji erdê radikir. Ew bi ecêbek kesnedî  
31

dimeşiya. Ew ziwa bîibii. Gava mêrik di ber wan re derbas  
bii, ew li wan hayî jî nebîi. Wî ne silav da wan îi ne jî tiştekan  
got.

Husik:

-Tu wilo bi ku de diherî birawo? got.

Weke ku mêrik ji xewê şiyar bibe, ji xwe aciz:

- Ez diherim cehenemê, got.

Husik:

- Te rast got, ji xwc ev rê rast diçe wir.

Mêrik an nebihîst, an jî bihîst lê guh nedayê, derbas bîi îi  
çu.

AşikAlî:

- Vê mekc Husik, got. Guneh e birawo. Ma te rewşa mê-  
rik nedît? Tu pbc bikê wê ruhê wî di pozê wî rc bavêje. Tu ji  
xclkê belengaz çi dbcwazî? Ma te riiyê wî nedît? Ew mchîi  
biiye, miriye.

Husik:

- Min tişt negot, ku...

AjikAlî:

- Guneh c, got. Mirov ji peyayên wilo re bibêje keko, wek mirov ji diya wan re xeberan bide.

Piştî demekc kurt ew traktora ku li bin siya darê bû, toz ii dbcan li nav hev xistin îi ji wan derbas bii.

Husik diranên xwe qiriçandin:

- Bimeşe, got. Bimeşe. Ya ku nê dibire, ya ku malan wê-ran dikc, bimeşe.

Memed:

-Înşaleh em ê kar bibînin, got. Dilê min weha hukum dike.

Ger em kar nebînin qet çê nabe. Divê em bibînin.

Osiv tê li dawiyê mabii. Memed li paş xwe zîvirî îi li wî

3i

nihêrî. Osiv di nav toza li scr rê riiniştibî. Mîna ku wî nimêj fikir, daqîil dibii îi radibî scr xwe.

Mcmmed:

- Çi bi vî Osivî hat? got.

AşikAlî:

- Xwezî ew nehata. Rewşa belcngazo ne î baş e.

Husik hêrs bii:

- Ma bi vê qiinê mirov kare were Çîikîrovayê? Gawirê dêhn, hem ew dev davêjc Çîikîrovayê, hcm jî bi dii me de tê. Kîçik lawê kûçikan!

Aşik Alî:

- Husik, wcha mckc birawo, got. Weha meke. Deriyê nê e. Bi niycta ku ew çend quruşan kar bikc her tişt da ber çavên xwe û hat. Ma qcy ew bi xwe nizane ku ew di çi rewşê



de ye? Wê çi gûyî bixwc, timctî...Tunetî kirasê ji êgir e.

Husik:

- Bila scgbav nchata...

Ew gihîşrin bcr Osiv.

Aşik Alî:

- Rabe kcko, got. Ma çi bi te hatiyc?

Osiv bi nalîn:

- Damarên çongcMj min hatine birîn. Ez nikarim bimeşim.

Dilê min wcr lcdixc, ku...

Aşik Alî rabû, bi milên wî girt:

- Rabe keko, got. Wê niha derbas bibc. Evqasî qels mebe.

Osiv jî:

- Wê derbas bibe, got. Hertim wilo dibe, hertim mirov...

Piştî demckê cw rabî ser xwe.

Edî dibî êvar. Roj dadikct pa | çiyar. Dora ewrên spî yê  
rojhilat dibiriqî. Hebekî wê de erdekî birincê dixuya. Li nav  
33

erdê birincê legleg li ser lingekî rawestiyabîin îi difikirîn. Dibii  
ku jî ew razabûn. Birinc bi qasî riliyckê bilind biibî. Di  
bin re avekc zer diherikî îi li cihokê kom dibî. Aveke zer îi  
girrikî...

Husik xwe daqilî ser cihokê kir, devê xwe xist avê îi vexwar.

Osiv bi lez bang wî kir:

- Husik, Husik, vcmcxwe birawo! Ev av hemii jehr e, vemcxwc!

Tu ê pê bimirî. Çi dibe bira, vemexwe. Ez bi vcxwarina  
vê ava ha ketim vî halî.

Husik guh ncda wî. Wî têt vexwar. Dii re Aşik Alî, Memed,  
Memedê Zarok, gişan av vcxwarin.

Osiv her li bcr wan digeriya:

- Jehr e, got, mirin e, got, zar ii zêçên me hene got. Pere nekir.

Wan pişta xwe dan cihokê îî rîniştin. Osiv îdare nckir, wî jî devê xwc xist ava cihokê îî têr vexwar.

Husik:

- Ew çi ye Osiv? got.

Ajik Alî pcyva wî ji dev girt:

- Husik, destê mcde, got. Dest belengêz mede.

Mcmcd:

- înişaleh em ê kar bibînin... Dilê min weha hukum dike.

Ger em ncbînin nabc.

Husik:

- Em ê bibînin, got. Em ê karekî pir baş bibînin... Ma qey te di xewna xwe de dîtiye?

Memed:

- Dilê min weha dibêje.

Memedê Zarok:

34

- Dilê min jî... Ga... qulonç çengel...

Husik:

- Bibire, got. Bibirc segbav.

Aşik Alî:

- Dest lêwik mcde.

Husik:

- Mirov dêhn dike, got. Em nê bi dest naxînin ew di derdê gayan de ye.

Aşik Alî:

- Caiiil e, got. Zarok e. Ma qet cahiltî di serê te re derbas ncbîiye?

Husik:

- Derbas bûye, lê nc ga, min di emrê xwe de ciwange nedîtine.

Aşik Alî:

- Ew jî wekc te yc, got.

Hiisik:

-OofAşik, tujî...

- Ê wa yc.

Bû êvar, dcr û dor tarî biin. Te digot qey asman ji stêrkan hatibti raxistin. Stêrk wilo pir biin ku mirov digot qey asman hemû stêrk in. Wawîk dikewtiyan.

Lihcfên xwe kirin behlîf ii xwe dirêj kirin. Birrek kelmêş, wek ewrckî reş hat îi li ser wan kom biin. Gezên kelmêşan wek derziyan di laşê wan de radibiin. Wan ew vir de ii wê de qewirandin, ne bîi, ew kuştin ne bii. Her cihên ku kelmêşan xwe lê datanîn, dinepbcî. Wan dest pê kirin ii xwe xurandin. Xirtc xirta wan bii îi xwc dixurandin.

Osiv:

35

- Rawesrin, got. Hûn nikarin razên. Heta sibehê cw ê me perçe bikin. Kelmêşên vir weke kêçikan bi mirov digirin. Çara wê nînc, divê cm agirckî dadin. Ew nayên êgir. Nayên dixanê.

Husik:

- Rast e, got. Ez jî zanim. Ez jî havînekê li Çîikiirovayê mabiim.

Wan çûn hemêz^k piiş ji gidîşa kêleka Husik anîn îi li ortê

danîn. Paşê kibrît vêxistin ii dan binî, agir bi carckê ve gurr bû.

Hebekî wê de riya spî, ya weke şcrîtekê zirav rohnî bii. Ava cihokê xuya bîi. Gava wan Osiv di şewqa êgir de dîtin, tirsîyan. Ew zer ii hişk bûbîi. Goştê rîiyê wî kişiya bîi. Devê wî ji hev mabii.

Husik:

- Kelmêş nayên şewqê, cm ê hcya sibchê wilo vêxin, got.

AşikAlî:

- Em ê vêxin.

Husik:

- Kelmêşên Çûkirovayê... got.

AşikAlî:

- Qet mebêje, got. Lawikekî feqîr hebiiye...

Husik:

- Dc bêjc Aşik, got. Çirka ku em hatine Çîiklirovayê ne te stranck gotiye, ne jî te li tembiirê xistiye.

AşikAlî:

-Weha bîi.

Osiv:

- Aaay, got, naliya.

Ajik Alî:

36

-Înşalch wê derbas bibe kcko, got.

Husik hcmêz^k pîişê din jî anî ii avêt ser êgir. Ji aliyekî ji ber germa hezîranê, ji aliyekî jî ji ber germa êgir, ji riiyên wan dilopên xwêdanê diherikî.

Husik:

-Aşik Alî, ya ku te bîska din dest pê kir, bibêje, got îî destêxwc  
li milc wîxist

Aşik Alî tcmbîir xist destê xwe, pişrî ku kok kir:

- Ji wê hêla me lawikekî fcqîr hebiiyc... Dilê wî ketibîiye  
keçikckê. Bavê keçikê keçik nedidayê. Goriye bila du hezar  
lîre bînc, bila hingî keçikê bibe. Lawik fcqîr bîiye, xwas ii tazî  
îî hcwcedarê pariyck nan bîiyc. Bi sala bi dîi kcçikê ketiye.  
Çawa ku lcwik ji kcçikê hez fikir, kcçikê jî ewqasî ji lêwak  
hcz fikir. Şevckê lcwik bi dcsrê kcçikê gin:iye îî gotiye, bime-  
şe cm herin Çûkûrovayê. Ew hatine Çîikîirovayê. Lawik zaro  
bîiyc. Bi roj xwe vidişartin û bi şev jî dimeşyan. Ew ditirsiyan  
ku hukiimet wan bigirc îî wan ji hcv veqerînin. Bavê  
keçikê /x^ngîn bûye. Dcst îî ling dirêj... Lawik bi rojan keçik  
baş vedişart îî bi xwe jî diçû ji gundan nan dida hev. Rojekê  
dîsan icwik keçik di konaleke di nav crdê birincê de veşarriye  
û çûyc ji gundan nêbide hev. Piştî ku roj çiiye ava ii şev  
tarî bûye, ancax cw gihîştiye kortala ku keçik tê dc veşartiye.  
Nihêriyc ku keçik nc li cihê xwc yc. Gcriyaye negeriyaye,  
keçik ncdîtiyc. Heta sibehc li wir çîiye li hatiye. Wî heta sibehê  
hêsirên ji xwînc rijandiye. Ccnet, Cenet! heta bi sibehê  
bang kiriyc. Gava dinya rohnî biiyc ii gawir îî musidman ji  
hev ferq bîinc, cw ji xwc re çî bibîne! Di kortalckê de komek  
hestiyên spî... Ji aliyekî jî guliyên kcçikê weke marekî reş, li  
aliyê din jî kincên keçikê yên perçe perçe...Gava iawik vê yekê  
dibîne scrê xwe winda dike. Dibêjin ku kelmêşan keçik  
37  
perçe kiriye, kelmêşan keçik xwariye. Guneh di stiiyê yên ku  
dibêjin dc...

Husik:

- Rast e, got. Gcr niha agir tunebiiya ma qey wê kelmêşan em jî perçe nekirana?

Memcd:

-Wan ê em bi saxî bixwarana.

AjikAlî:

- Lawik li hemberî hestiyên spî riiniştiye, guliyên wê xistine destên xwe ii stranek gotiye.

Husik:

- De, got. Dc ez hcyrana çavên te bim Aşik.

Aşik tembiira xwc xist nav dcstên xwe îi xwe bi ser tembîirê de tcwand. Lêxist, tembîir peyivand ii wî jî got. Dengêkî Aşik hebii, wck dengê Veyscl, mirov dişewitand. Aşik got îi yên din di cihên xwe dc sar man. Ji devên wan ji "ax"ê pê ve tiştck dervedikct.

Aşik Alî:

- Wcha, got. Lê lêwik guliyên keçikê yên şîrikî xisrinc destê xwc îi ketiye nava gundên Çiikirovayê, ew li kê rast hatiye, derdê xwe jê rc gotiye îi kula dilê xwe jê rc rijandiyc, dil li wan perçe kiriye. Diirî scrê dijminan be...

Dûre Aşik tijc bîi. Tcmbîira xwe hemêz kir îi xwc baş bi scr de tewand, bîi bi qasî destekî, ew wcke zarokekî pênc salî ma. Dengê wî yê gurr îi xun; di tarîtiya şevê de pêl da ii di hemîi deştê de bclav bii.

Ew radibii, dadiket, hêrs dibii, diqîriya. Wî li ser derd û kulan digot, li ser evînê, li ser mirinê, li ser tunebînê, li ser êşa zirav, li ser tayê, li ser zar ii zêçan, li ser tenêbiinê, li ser diirbiinê... Li ser Kizilirmak, li ser Seyhanê, li ser Ceyhanê

38

digot. Li scr Çîikûrovayê, li ser mêşan, li ser gawirên motoran.

Li scr dinya xcrab, li ser çiyayên bi bcrf îi kciryên xczalan

digot. Li ser axan, li ser stemkariyê digot.

Heta bi berbangê got. Gava dinya rohnî bii îi bayê sibehê

yê hênik hat, wî hêdîka tembîira xwe danî kêleka xwe. Jê pê

ve devê xwe venckir îi tu tişt negot. Tenê riyyê wî rehet û di

hundurê ronahiyeke dilşa dc bii.

- Aşîk, gotin. Xwcdê ncxwçşiyê nîşanî tc nede, timebîinê

nîşanî te ncde. Ya ku tu dcstê xwe biavêjê bibe zêr.

Ew ji wir çîin. Agirê ku li dii xwe hişribîin vêketîbîi. Diire

agir winda bîi. Ji dîir ve tcnê dixaneke zirav xuya dikir.

Gundê ku ew tê re derbas biin, navê wî Akköy bii. Gund

xerabe bîi. Kozikên ku bi rêxê hatibîin scyandin, qamîş li ser

nema bîin, hcma cw wilo spartibiin girik. Bi dii wan de keriyek

kîçîk dihat. Gava ku ew di ber xirbeyckî xerabe re derbas

biin, kalekî çavbişîlaq û pişocîiz bang wan kir:

- Merheba.

- Merheba, wan jî gotin.

- Hîm ji ku tên û hîin ê bi ku de hcrin? mêrikê kal ji wan

pirsî.

Memed:

- Em ji Urumê tên ii em li kar digcrin.

Pcyayê kal:

- Kar di devê piling de ye, got. Ku tu karibî bistînî, bistinc.

Mcmmed:

-Înşaleh emê bibînin.

Kalo:

- Çiikîirova ne ew Çîikîirovaya ku tu pê dizanî, erd îî.ezman  
bûyc traktor.

39

AşikAlî:

-Wê Xwedê li fcqîr ii belengazan were rehmê, got.

Kalo:

-Amîn, amîn, li me hemiyan...

Memed:

- Di xweşiyê de bimîne, got.

Kalo:

- Zadekî Weliyê me heye, raza ye, got îî kete riya wan. Zadê  
ku radizê makîne nikare biçine. Hiin çiyayî paleyên baş  
in.

Memed:

- Em pir baş diçinin.

Husik:

- Em diçinin

Memedê Zarok:

- Ez jî diçinim, got. Qulonçê dasînî, weke hcylvê.

AşikAlî:

- Tu jî diçinî, got. Çima tu ê neçinî, çiyê te kê m e?

Kalo zarokek xist pêşiya wan îî ew şandin mala Welî.

Lawik:

- Apê Welî, got. Bavê te ev şandinc, ew ê zadê te biçinin.

Ev baş diçinin. Bavê te wilo got. Ev eynî wcke bîçerê ne. Yaaa...

Dîire wî şclwcrê xwe yê reş îî qetiyayî ber bi jor ve kişand  
îî ji wir bi dîir ket.

Welî:



- Baş e ku hiin hatin, got. Zadê min bi erdê ve bûye yek.  
Makînc nikarin biçinin. Tu makîne nikare biçine.

Memed:

- Em karin biçinin.

40

Welî:

- Hîin ê bi çiqasî biçinin?

AşikAlî:

- Hcla carckê em crd bibînin.

Piştî ku wan avck vcxwarin, ew çiin nav erd. Zad bi qasî  
bîst donim genim bii. Ew wekc hesîlê li erdê hatibîi raxisrin.  
Similck jî li scr xwe nemabîi.

Aşik Alî:

- Wax, got, mehû bîye.

Welî:

- Gava Xwedê nedc nadc, got. Ger piling têteta nava vî  
crdî nikarîbîi wilo bikira. Qismet e, genimê weke qamişan  
raza ye. Baş bû ku hiin hatin.

Ji bo çinîna wî bîst donimî bi bîst lîran li hev kirin. Wan  
zîika dascn xwe dcrxistin îi kcrin nava crd.

Mcmcd:

- Min ji wc rc nçgot, em ê kar bibînin? Dilê min wisa hukum  
dikir. Li vê Çûkûrovayê binihêrin, mîna dinyayekê ye.

Çawa kar tuiicyc! Tcnc ku mirov bbcwazx kar bikc.

Hcrkesî dcst bi kar kiribûn. Hela helaya wan biin îi diçinîn.

Osiv serc xwc xistibû nav çongên xwe îi li ser qiçekê riiniştibû.

Memedc Zarok ralişt dasa Osiv. Gava Welî ket riya

malê da hcre ji wan re xwarinê bînc, Mcmedê Zarok bi dizî

nêzîkî wî bii.

- Apo, got, tii c heqç niin jî bidî min? Gayên qidonç-das...Wî xwczîya xwe daqurtand.

Wclî şaş ma. Bcrê xwc bi yê n ku zad diçinîn vekir:

- Ev çî dibêjc wilo, dchn e çî ye?

Aşîk Alî:

- Guli mede wî, got. Ew zaro ye.

41

Mcmedê Zarok bi hêrs bcr bi berê genim ve çîi.

Husik:

-Te çî ji Welî axa re got kuro? Kuro lawê kiiçikan...

AşîkAlî:

- Ma wê çî bibêje. Hebe tunebe wê li hejmara traktorên ku li Çîikîirovayê hene pirsî be. Ma wekî din wê çî bipirse?

Nc wilo Memcd?

Memcdê Zarok:

- Ji xwe min jî ew pirsî, got.

Heya pişrî nîvro bêî ku piştên xwe rast bikin, çinîn. Ji germa rojê leylan li ser wan rabîbîi. Çinîna genimê razayî ne wckc çinîna gcnimê li pê ye. Pişta mirov dişikînc.

Dcma firavî nê Wclî ji wan re satilek şorbç anî scr erd. Ew riiniştin îî şorba xwe bi îştch xwarin. Lê Osiv pariyek jî nexwar. Hcvalên wî kirin nekirin, li bcr gerîyan nçgcriyan, şorbe bi wî nedan xwarin.

Pişrî xwarinê, bêî ku ew westa xwc bigirin, wan dest bi çinî nê kirin. Ew lê vcbîibîin, bi awayckî diçinîn ku bîçcrê li bcr wan gîi dbcwar.

Nêzîkî roava bii, nihêrîn ku Osiv hat, bi hêrs dasa xwe ji

destê Mçmcdê Zarok girt ii dcst bi çinînê kir. Hcr dcrê wî diricifî.

- Tu nexwçş î, meke Osiv, gotin. Tu ê bi vî awayî xerabtir bibî. Tu ê vê havînê li Çiikûrovayê perîşan bibî. Tu meçine. Em ê di nava xwe dc parekê bidine te jî. Em ne ker in, qey em jî camêr in.

Osiv qet dcng ncbir xwe. Serê wî di ber wî de bii îî helke helka wî bii diçinî. Dîire ji nişkê ve ket xwarê, dasa wî ji destê wî ket.

Aşik hat, Osiv ji erdê rakir.

4%

- Mcke keko, got. Tu nexweş î.

Osiv )i nava crd derxist, li paş xwe zîvirî.

Husik pir hêrs bû:

- Şeytan dibêjc rahêjc dasa wî îî di nava serê wî de lêxe, çî dibe bila bibe. Kuro segbav, tu zanî ku tu nexwçş î, tu mirî yî, çî ji te re ku tu bidî dîi me îî werî van deran? Li cihê xwe bisekinc, li gundê xwe bimîne, bcla serê me. Tu çî ji me re dibîbar...Jixweem...

AşikAlî:

- Husik, got îî hêrs bîi. Tu ji vî belengazî çî dbcwazî Husik?

Ew nc nanê me dbcwe, ne jî ava me vedbfwc. Tu ji vî zilamê nexwçş çî dixwazî birawo? Ji xwe Xwedê lêxistiye, ma em jî lêxin.

Husik:

- Bila bisekine, got. Bila li cihê xwe bisekine. Tê gcnim jî diçine! Dimire! Genim jî... Ma ne cw bîi yê ku digot, Çiikîirova cchcnem c û riya me dibirî? Niha jî...

Wan heta bi roava çinîn. Lê xclas nckirin, dasên xwe xistin ber piştên xwe îî vcgeriyan gund. Bayê xerbî bi hemîî hêza xwc dihat. Welî merşck li derve raxist û cw li ser rînişrin. Li kclcka wan, çclekê devê xwe xistibîî nav giha hêşin îî dbcwar. Dcvê goiika wc di guhanê wê de bîî û şîr dimêt. Bêhna gihayê ii wan dcr û doran bclav dibîî.

Welî siniyck mezin tijc savar, anî îî li bcr wan danî. Savar rijî bû, lê gidi ncdanê, bi îştah xwarin.

Jina Wciî niîh zaro jê rc çê bîîbii, ew li hundir razayî bii.

Li kêicka wc jî zaroka wê ya niizayî li ser scradê razayî bii. Sê zarokên Wclî yên din jî hcbiin. Hersê jî nexweş, bi tayê biin. Hcmîî diricifîn. Gava Memedê Zarok hatibii hundir, wî hingî ew li hundir dîtibim.

43

Osiv şîv jî ncxwar. Diranên wî bêhawe li hev diketin. Mirov digot qey hesp di riyên bi kevir re diçin. Hertim jî wî axîn dikişand.

Husik:

- De, digot. Ez niha çî bikim? Wê ev zilam min dêhn bike.

Li vê germa Çiikirovayê nexweşî ji me kê m bii.

AşikAlî:

- Tiştê ku wê bibe dibe. Mirov nikare pêşiyê lê bigire. Em ê bikişînin birawo, ma wekî din çî ji dcstê me tê...

Welî nivînê jina xwe li ber dikê raxist. Nivînê zarokan jî li ber ê wê raxistin. Bayê xerbî toza li ser nivînan dimalişt.

Palan jî lihêfên xwe vekirin îî ew li ser merşa di bin xwe de raxistin. Yên din razan, lê Aşik Alî û Welî hişyar mabîin îî dif)eyivîn.

Welî:

- Bila erd ji min bistînc, bila bistîne, da ez jî xclas bibim...  
Tu bixebite, bbcebite, diran nemîne, neynîik nemînc, dcst  
nemîne, ling nemîne îî nêviyê wê bide yê ku kar nake, ma  
wilo dibe? digot. Tunc, time, ji vê çêtir tunc. Mirov birçî bimirc  
çêtir e. Bila ew erd ji min bistîne da ez jê xelas bibim.

AşikAlî:

- Weha mebêje birawo, digot, li hember derdiket. Tu şaş  
î. Erd cihê ye.

Welî:

- Rast e, ku erd yê te be baş e, lê yê xelkê be tu ê wilo bibî  
kole. Ev kcda min xwîn e. Haya wî tew jê nîne. Binihêre, tu  
rewş îî pergala min dibînî. Bila erd ji min bistîne da ez xelas  
bibim. Ji xwe wê bistîne. Çirka ku traktor harine, yê ku erd  
deman dikirin ji navê rabiln. Bi tenê ez mame. Bila ez bimirim  
îî jê xelas bibim. Çi dibe bila bibe, jiyanev be...

44

Welî hîna jî got. Ew kuftir bîi, wî xcber da, lê Aşik Alî wer  
ku wcstiyabii, cw di xcw rc çîi. Wî hew gorinên Wclî bihîsrin.  
Wan roja dudan, piştî nîvro zad hcmii çinîn. Perên hiir ji  
Welî xwestin îî weke biran li hcv par vc kirin. Osiv pcre nedixwest.  
Aşik Alî bclîkî zêdcyî saetekê li ber wî geriya ta ku bi  
zorê para wî xist bcrîka wî.

Gava ku pcre ket dcstê Mcmedê Zarok gclekî kêfa wî hat.  
Wî pcre xistin destên xwe, di ser hev re qulupandin, lê nihê-  
rî, xist bêrîka xwe, dîsan derxist. Dîi re da Memed. Lê paşê  
dîsan bi paj de jê xwcst. Dîi re dayê, dîsan jê stend. Dawiyê  
xist bcrîka xwe û destê xwe qet ji bêrîka xwe dervedbcist. Carc

cw pçrc ji bêrîka xwe dcrdbcist ii lê dinihêrî. Çii ba Memcd:

- Apc Mcmed, got, ez ê cotck ga bikirim, cotek gayên quionçmçzin, ez ê bibim wclct...

Husik ji Mcniedê Zarok pir hêrs bîi, wextî lê bixista, lê

Aşik Aiî nehişt. Dîi rc li Memcdê Zarok zîvirî:

- Lo Mçmcd, got, tu jî cvqas dinya nedîtî mebe, lo!

Mçmcd:

- Ma min ji wc rc ncgot, cm ê kar bibînin, cm ê peran qezcnc bikin. Em c îsai pir peran bidin hev. Dilê min wisa hukuni dikc.

Jina wî, zarokên wî û bizina spî jî qct ji bîrê nediçîi.

Ji wê pc ve ew ii her derê Çîikîirovayê gcriyan. Wan pirr rişt dîtin. Pirr tişt bi scrê wan de derbas bîin. Gundên ku neçîmê, axaycn ku xwc neavctinê, nçman. Çîikîirova beroş, ew jî çoçik, bimeşç bavo bimçşç. Ew her geriyan. Rojekê gava di mêrgekê rc derbas bîin, ew heya qirikê di herriyê de man. Şofêrê traktorckê ku ew xelas kirin, ji wan re behsa wê avzêl-45

kê kir.

Li deştê gçlek pale bêkar digcriyan, paleyên fena wan birçîi ii belengaz. Hemîi jî wckc wan şaj mabiin. Di riyên ku tozê dida çongên mirov de traktor, zadçin îi kamyonên şîn, zcr, sor ii şîrkî derbas dibîin. Li ser wan bi qasî nîvtiliyê toz girtibîi. Ji tozê qet rengê makînan xuya nedibîin.

Deşt hemîi ji tayê diricifî. Rîiyê mirovan yên zer dirêj biibîin.

Giha hişk bûbii, pel li şaxan çilmisîbîin. Ser îi binê dcştê ji gcrma zer bîibîi. Wan miriyên ku di riyên dc mabiin, dîtin.

Berêvarckê, miriyê ku cw lê rast hatin, di nav toza rê de mabîi.

Rîiyê wî yê ku di bin tozê de xuya dikir, wekc kehribarê bii. Çîmên wî rcp ii lingên wî dîk biin. Piştî hatina traktorên, mirov bi carckê ve hatibîin guhertin. Ew tewlo mewlo biibiin. Wan li rîiyê mirov jî ncdinihêrîn. Van makîneyên ku nizanîbiin bê wê çî ji wan rc bike, ji wan re biibûn weke pîitan. Li gundekî axayckî xort bê sebeb tif kir wan, ji dê îî jinên palcyên bêaqil, ku ji çîyan hatibiin Çîikirovayê re xcber û gotinên ncmayî kirin. Gcr Aşîk Alî bi Husik ncgirta wê Husik mêrik ji hev perçe bikira. Wî ji kerban serê xwe li dara tûyê, ya li scr rê, ya ku pelên wê di tozê de mabû, dbcist, digiriya, dinaliya û xcberên ncbaş ji Çîikirovayê re dida. Wan hîn geiek riştên din jî dîtin, tiştên nedîtî di scrê wan rc dcrbas biin. Ew du rojan jî birçî man. Ger ne ji Aşîk Alî bîiya rewşa wan xerab bii. Ew li gundan gcriya, li tembiirê xist ii nan dan hev. Gcr wek berê bîiya, wan ê Aşîk Alî li scr dcstên xwe bigerandina. Niha tew li rîiyê wî jî nedinihêrîn. Berê xwe davêrin Aşîk Alî, li ber wî digeriyan, ji bo ku li deng îî tembîira wî gididarî bikirana.

46

Ew di tozc de mabiin. Xwêdana ku ji laşê wan diherikî tcvîî to-zê dibîi û dibii herî. Mîna ku ew ji nav çiravê derkctibîin. Tiştê ku ncdîtibîin, dîtin. Tiştê ku nekişandibîin, kişandin. Aşîk Alî li ser dcrd, li ser tuncbîinê, li ser riyên bi toz, li scr axayên zalim, li ser kelmêşên bi hesrî yên ku weke maran bi mirovan vedidan stiran gotin. Yên ku dcngê Aşîk dibihîsrin, dilê wan pcrçe dibiin, di nava kid ii kedcran de diman. Em bèn scr Osiv, nc ez bibêjim, ne hiin bibihîzin! Ji wê re

dil dcbar nakc. Ku dilê mirov kevir be jî wê ji ber rewşa wî bihcle. Ew du hcfteyan bi wê bclengazip xwe bi dîi wan de dikişkişî. Yên ku li hcr aliyên xwe agir dadidan, bê hiş diketin û ycn ku wcke berfa zozanan diqerisîn. Piştî du hefteyan êdî cw nikarîbû bimçşiya. Wî nan nedbcwar, lê bêî navbir ava Çiikûrovayê ya şîrgcrm, a mîna xwînê vedbcwar. Ew tenê çerm û hcsrî mabû. Wan bi dorc ew li pişta xwe dikirin. Bê-tir Husik cw hiidigirt. Ji ber ku di nav wan de yê herî bi qewct Husik bû.

Osiv:

- Min bavcjin îi iicrin, digot. Ez ji wc rc biimc bar. Bila ez jî wck wî miriyc ha ii scr rc di nava tozê dc bimînim.

Ycn din guii ncdidan wî.

Pêşî Husik hişyar bîi. Dcstcn xwc yên mezin kirin hutik û çavcn xwc firkandin. Hcr derê wî dişewitî. Dii re Husik Aşik Aîî hişyar kir. Dû rc Mcmcd... Osiv hcya bi sibehê ranezabii, cw hcr ji bcr cşa laşc xwc naiip bii. Niha jî ew hêdî hêdî dinaliya. Diranên wî jî wckc ku bi licv ve hatibîin çengelkirin.

Mcmcdê Zarok jî dcstc xwc yê rastê xistibii bêrîka xwe îi li ser raz^ bû. Razanekc wî weke ya zarokên biçîik hebîi. Te digor qey wî ncfcs ncdigirt.

Mîna ku êvarî baran bariyabe, avî ketibii, der îi dor şil îi

47

pil bîibîi.

Çîikiirova hişyar dibîi. Dîkên gundê li jêrî wan bang dan.

Dîi re dengên makînan hatin. Paşê jî dengê mirovan. Dengên rojê tevlî dengên makînan bîin.

Paşê jî li erdê leylaneke zirav bilind bîi, firêze biriqîn. Ji



diir ve, ji pişt Gawirdaxê topek şewq pijiqî.

Ji vî cihê re axa Yiiregirê dibêjin. Ev axa YUregirê teze ye,  
weke laşên jinan ncrm ii germ e. Tu can lê biçînî wê şîn were.  
Zadekî wê heye, dibêjin ku piling jî têkeve nav ne xem e.  
Ji yekê sih, ji yckê çil dide. Gava pembîiyê Yiircgirê derdikevc,  
hemîi crda Yiiregirê çilspî dbcemile.

Husik bi pozikê sola xwe Memedê Zarok tevda.

- Rabe, got. Rabe kiiçik lawê kiiçikan. Tu hcta bi nîvro radizê!  
Ev kiiçikbav li serê min bîiyc Keldîkoglu.

Aşik Alî:

- Husik, got. Tu bi her awayê xwe baş î, lê xwezî ev adeta  
te tunebîiya.

Husik:

- Binihêre, got, tu bi Xwedê kî A^ik binihêrc bê ew çawa  
raza ye! Pcre xistinc bêrîka xwe, dcstê xwc jî xistiye bêrîka  
xwc îi li ser wan raza ye. . . De werc dêhn mebe! Tu dibê qey  
em hemîi diz in.

Aşik:

- Hcr xuyên te baş in, Husik... Lêwik nedîtiye. Ne bi zorê  
yc... Ncdîtiyc.

Memedê Zarok bêî dilê xwe hişyar bîi.

Êdî kêr gihîjtibîi hestî. Wan ji mêj ve biryar dabîin, ku vegerin.  
Lê Memed pêxîla wan bernedida. Her ku wan berê  
xwe bi welêt vedikirin ku vegerin gundê xwe, Memed ji dîir  
ve gundck didît.

48

- Hela cm hcrin vî gundî jî, cw ê helbet li wir karek hebc,  
digot, li ber wan digeriya îi ew dibirin wî gundî. Wilo, belkî

wan deh caran berê xwc dan gundê xwe, ku vegerin, lê Memed berê wan bi gundên din vcdikir.

Îro êdî dawî bîi. Carckc din veger tuncbii. Kar tuneyc, ew ê çî bê scbcb îî perîşan li Çûkîrovayê bigerin. Memed jî hêviya xwe birrî bîi, stîiyc xwe xwar kiribîi.

- Em herin birano, ma çî ji dcstê me tê, cm herin, goribii.

Husik Osivê ku li erdê dinaliya rakir îî li pişta xwe kir.

Osiv ji nişkê ve veciniqî.

- Min deynin. Êdî ez wcstiyam wer ku ez li piştên cihê cihê siwar bîim. Ez ji bcr xwc fcdî dikim. Ez ji we re bîime bar. Min dcynin. Ez ê bi xwe bimeşim. Min dcynin. Wî lingcn xwc li hctên Husik dixistin. Min dcyne! Ku tu min dancynîczc bimirim.

Aşik:

- Mckc birawo, got. Ma cv rcwşa tc ya bi xwemeşandinê ye? Vê mckc. Êdî va yc cm diçin malê.

Osiv guhdarî nckir. Wî iicr digot, min dcynin. Husik jî iiêrs bû, cw danî û meşiya. Mcmcd kct bin milckî Osiv, Aşik Alî jî kct bin milê din û bi dû Husik dc mcşiyar. Serê Osiv pê vc dalitiyabû. Gava cw di nava wan de dimeşiya, lingên wî ii licv digcriyan îî huidukiunî. Pişrî ku ew demekê wilo mcşiya, bi carekê ve cdî hcw iingcn wî pê ve hatin. Ger wan miiên wî bcrdana, cw ê dcverii bikcta xwarê.

Mcmcd bi icz ew girt û ew li pişta xwe kir.

Memedê Zarok:

- Ger ew min bikujin jî ez naçim ba Keklîkoglu. Ez ji birçîna bimirim jî ez dîsan naçim ba wî. Ne wilo apê Aşik?

Aşik Alî:

49

- Ger ez bi tcnê bîima dinya hîç bîi. Ez di şîina te de bîima ez jî nediçilm ba wî.

Mcmedê Zarok:

- Ew ne heqê min didc min, ne jî tişteki... Ew bi lêdanê jî min dikuje.

Memed:

- Ez ê niha çawa li riiyê jina xwe binihêrim. Ez ê ji zarokên xwc re çi bibêjim? got.

Aşik Alî:

-Tu ê dîsan lîstikckê dencînî. Çavê te lê ye tu dîsan lîsrikekê derxînî Mcmed?

Husik:

- A niha, a niha ku kar hebc îî bêjin wcre bbccbite, ez dîsan jî nasekinim, ez ê hcrim. Bcs e êdî! Ev rezîlî îî kepazetiya ha bes e. Ku Çiikîrovayê bi ax îî kcvirên wê, bi motorên wê îî bi van tirimpêlên wê ve bidin min cz dîsan nasekinim.

Aşik îî Husik di rcx hcv de dimeşyan. Mcmcd di bin Osiv de westiya bîi îî di pêşiya wan de dimçşiya. Serê Osiv bi aliyekî ve daliqyabîi ii bê deng bîi. Aşik çii ba Osiv, daqûl bû îî lê nihêrî.

- Husik, got, rcwşa Osiv xcrab c. Stiiyê wî ketiye... Xwedê zane... Xwezî cw bigihîje gund îî di nava zarokên xwe de...

Husik:

- Qet hêviya min tuncye, got. Ez bawer nakim ku cw bigihîjc gund. Ez li bcr dikcvim ku wê Osiv li Çiikirovayê bimîne...

Ajik Alî,

- Zor e, got.

Husik:

- Ger em wî bigihînin gund ew ê jina wî were pêşiya me.

50

Ew ê zarokên wî li scr scrên me kom bibin. Ez ê ji wan re çi bibêjim? Osiv ii ku ma? ew ê bipirsin. Ax, ku nemira... Ku ew nemira min ê qurbanek bida.

Dibîi êvar. Ew bi meşê gihîştin ber erdckî pembo. Darikên pembo heta çavan çav didîrin, bi rêz biin.

Memed Osiv danî ii cw li ser piştê di nava erdê pembo de dirêj kir.

Ajik Alî cba xwe ji xwe kir îi di bin Osiv dc raxist.

- Bila fcqîro ii scr crda hişk nemire, got.

Ew li ser serê wî kom bîn. Osiv carinan çîpên xwe ji hev dikirin, diricifî, paşê dîsan dihat scr hişê xwc û rişrin ku nediharin fêhmkirin digot. Çavên wî beloq bîbîn.

Mcmcd:

- Aşik, ii scr bbcwînc, got. Biia fcqîro bê dîn îi îman neçe.

Aşik dcst pc kir û xwend.

Ew wc şcvc iictanî sibclîc ltcî ku çavcn xwe nerm bikin, li lier scrc Osiv rawcstiyân. Osiv ncmir, cw hcbekî bi ser hişê xwc vc hat.

Husik Osiv ii pişta xwc kir:

- înşaiç cw namirc, got. înşalch cw ê bigihîje welêt.

Wc rojc, li dor nîvroyê dîsan rewşa Osiv xerab bii.

Husik:

- Ez wî ji pişta xwc nakim, got. Gcr cw bimirc jî bila ew li pijta min bimirc. Tu ncmaye cm bigihêjin Çûkîrovayê. Ger

bêhna çîyan tckcvc po/^ wî cw ê jîndar bibc. Ez careke din wî ji pişta xwc danaxim.

Li milc wan yê rastê, di nava daran dc gundckî xuya dikir.

Memed nêzîkî Aşik bii, bi milê wî girt:

- A,sik, got, tu guh mede wî dînî. Wê Osiv li ser pişta te bimirc. Em nikarin wî di nava erdên pembo de veşêrin îi he-  
rin. Tu guh mede wî, werc cm hcrin vî gundî.

Aşik Alî:

- Çênabe, got, ger ew bimire wê bimire. . .

Memed:

- Aşik, got, ma em ji bo çî hatin Çîikîirovayê? Em ji bo kar harin. Wê Osiv bimire. Ger ew bimire jî bila li gimd bimire.

Aşik:

- Ha ew li gund miriye, ha jî li vir miriye, ma fêrqa wê çî ye?

Memed:

- Wê gundî mcytê wî rakin, qet nebe wê wî li goristanê vcşêrin.

AjikAlî:

- Ez bawer nakim, got. Vir Çîikîirova ye, Ew çiyayiyan di goristanên xwe dc vcnaşêrin.

Memed:

- Aha va ye em diçin. Em ê çawan dcsrvala hcrin. Em ê ji xelkê rc çî bibêjin? Em ê ji jinên xwe re çî bibêjin? Em ê ji zarokên xwe rc çî bibêjin?

Aşik Alî:

- Ma cm ê çî bibcjin, got. Me qezenc kir ii da qumarê. . .

Memed:

- Kckê Aşik, got, ez tēm dest îî lingên te kekê Ajik, ev gundê ha bi dar îî ber c. Ma te qet gundên wisa li Çîkîrovayê dîtiyc? Dilê min ji min re dibêjc. Were em riya xwe bi vî gundî bbcin. Ji sedî sed wê li vî gundî kar hebe. Ger em li vî gundî jî kar ncbînin wê çaxê serê min jê bikin.

Husik li pişt xwe zîvirî:

- Mcmed, bi sertî got, dîsan çavên te li gundekî ket. Ma tu 5^

dîsan Aşik dixapînî? Hîin herin, ê min ez nayêm. Ya ku em dikişînin hcmû ji bcr vc îmada tc ye.

Memed xwc bi milê Husik vc girt.

- Binêrc, keko, got, ew ê li pišta te wê bimire. Wê ev belengaz bimirc. Qet nehe bila ew li gund bimire, bila ew di goristanê de were vcşartin. Binêre, ma qct we gundên wilo li Çîkirovayê dîtiye? Ew di nav daran de yc. Wê mudeq li vî gundî kar hebc. Gcr em li vî gundî jî kar nebînin, wê çaxê serc min jê bikin. Qcda min ji wc re helal e.

Pajê ew li Ajik Alî zîvirî:

- Kekê Aşik, got, tu guh mcde vî dêhnî. Li vî gundî kar hcyc. Binêre, di nava daran dc yc.

Aşik Alî:

- Ez çi zanim Mcmed, got. Ez çi zanim, xwezî kar hebîiya...

Husik:

- Tii dîsan ncrm bû yî, Aşik Alî, got. Wê çaxê li Çîkîrovayc şrcpczc bibe.

Mcnicd:

- Ez hcyrana çavên te bim, Husik, got, binêre, bê çiqas dar li vî gundî hcnc. Muheqeq cm ê ii vir kar bibînin.

Husik:

- Ez nayêm, got. Hîm licrin.

Gava ycn din dimeşyan, Memedê zarok li dîi wan dima.

Memed dît ku Mcmedc zarok li dîi wan maye, wî bang kirê:

-Zii wcrc vir.

Dcngê wî pir bi hêrs bîi. Lawik tavilê reviya îi gihîşt wan.

- Ez ji wc re dibêjim ku ev gund bi dar e. Li vî gundî kar haye. Ma wc li vê Çîkîrovaya ku ji germa leylan jê radibe, qet gimdekî wilo bi dar dîtiye? Osiv jî wextî bimire. Qet ne-  
53

bc hcma ew li vî gundî bimira. . .

Dengê wî lerizî îi girî kete qirikê. Te digot qey piştî kêliyeke din ew ê li vê deştê Osiv li ber xwe dirêj bike ii stranên şî-nê biavêje ser. Ew di ber xwe de dipcyivî.

- Ma qey Osiv ne gundiyê me ye, ma me bi wî re nan ii av ncxwariye, ma qey nabe ku em wî li vî gundî veşêrin, li bin van darên hênik. . . Dibe ku jî li vî gundî meleyck hebe, bi dengê xwe yê zîz li ser Osiv bbcwîne.

Her ku diçii gcrma rojê zcderir dibîi, ew ji gundê bi dar bi dîir diketin. Hcrçiqas lingên Mcmcd ber bi gund ve dikişyan jî, lê wî gotin nedbcist serên hevalên xwe.

- Hîm nizanin bê Osiv lawickî çiqasî baş e. Ma dibe ku cw li vê çola Xwcdê bimire, ma qct dîbc ku tcrmê wî li vir, di bin vê germa dogehî de bihele? Ji xwc li vê germa han binerin, vê germa ku dişcwitîne ii dihelîne. Ma ne gunch e ku tcrmê Osiv li vir bimîne?

Husik:

- Tu li Osiv mefikirc. Ez ê wî bi mirîtî jî, bi saxîtî jî bibim

scrê çîyan, bibim ber avên hcnik, bibim ser kchniyên sar.

Aşik Alî:

- Mmcd, got, kekê Memed, em evqasî geriyan, em evqasî li vê mîrata Çîikîrovayê geriyan, em evqasî li vê Çîikîrovaya ku dişewitc geriyan. . .

- Lê ev gund bi dar e, Memed got.

AşikAlî:

-Ger bi dar bc...

- Binêre Husik, binêre Aşik Aiî, binêre Memed tu jî

Osiv. . .

Ew li orta rê rawestiyan. Gava ew rawestiyan Memed ji bîr kir ku wê çî bibêje, ew dcmekê fikirî.

54

Ew dcşta ha ji vir hcta dcrya spî dirêj dibû, her ku diir dibii jî rengê wê şîn dibîi îi dirêj dibii.

Mcmcd stûyê xwc yê dirêj bcr bi Husik ve dirêj kin

- Gava niha em bikcvin gund, wê zarokên me îi gimdî birevin pêşiya me?

- Wê wcrin pêşiya mc, Husik got.

- Em ê ji wan rc çî bibêjin?

- Em ê bibêjin ÇOdcûrova bincrd bîiye. . .

- Ma em ê wilo bibêjin? Memed bi qerfgot.

- Em ê wilo ji wan rc bibêjin, Aşik Alî bi dengekî nerm ii hê bi qerftir got.

- Ma em ê ji zar îi zççên xwe re çî bibêjin?

- Em ê bibêjin erd qeiişî ye ii Çiikiirova ketiye binê erdê.

- Ezê bibcjim çî?

Husikhêrs bîi:



- Tiştê tu bibêjî bclî yc, got, bcrê xwc bi çiyân ve kir ii me-  
şiya.

- Hcrc! Mcmed got. Herc dojchê. Bila vê zivistanê zar ii  
zcçcn tc jî ji rûyc te birçî bimînin. . .

Ew di nîvc rê dc rawcstiyabû, iierdu milcn xwe di ber xwe  
de bcrdabûn û bi dengckî bilind diqîriya.

- Tu ê Osiv bikujî, wî digot. Tu ê bibî qatilê wî. Dibe ku  
li vî gundî mcieyckî ku niviştckê ji Osiv re çêbike, hebe. Dibc  
ku Osiv bi niviştck xcias bibc. Dibc ku li vî gundî yekî ku  
dcrziyckê li Osiv bbcc hebe, yckî ku hcbckê bidiyê hebe, ger  
em herin vî gundî dibe ku Osiv ncmire. . . Dibe ku bîreke vî  
gundî ya ava cemidî, kehniyeke vî gimdî î hênik hebe. Dibe  
ku Osiv xwe di ava sar dakc îi bi ser hişê xwe ve were.

Her ku wî digot Husik hê bêtir hêrs dibii. Her ku ew hêrs  
dibii jî, wî bêtir )fwêdan dida.

55

Ew hebckî bi dîir kctin, lê Mcmed wilo di nîvê rê de ma.  
Wî di ber xwc de bi pistînî tiştin digot. Siya ewrekî di ser wî  
re bihurî. Pişrî siya ewr, rojê xwe weke topekê bera ser deştê  
da. Deng ji Osivê ku li pişta Husik bii dernedikct, ew mîna  
ku razayî be, mîna ku miribe, lingên wî bi erdê ve dikişyan  
ii di riya bi toz de xêzên dirêj çêdikirin.

Roja dilşcwat li firêzan dixist, şcwqa wê ya pir, çavên mirov  
dişewitand. Ji ber şewqa rojê wan nikarîbîn çavên xwe  
vekirana îi li wî alî binihêrîna. Hemîi di xwêdanê de mabîin  
îi ji tîna dişewirîn. Di nav zeviyên der ii dora wan dc lcglgên  
çîpdirêj bi çîpên xwe ycn zirav xwc li ba dikirin, stîiyên  
xwe yên dirêj hebckî din jî dirêj dikirin ii dimeşyan. Ji hember

traktorekê batozek avctibîi dOî xwe îî hêdî hêdî dihat. Li dîi batozê jî sî-çil karker, bêdcng. snixwar îî xwas dimeşîyan. Ew westiyayî îî ji haldekerî dixuyan. Ew vekîşîyan kêlcka rê îî heta ku batoz îî karker derbas bîin ew li kêleka rê rawestiyan. YScn ku ew têkcvin rê Mcmed:

- Bi dar c, hênik c, got. Li van deran, li van nêzîkan qct av tuncyc. Ger wilo hcrc cm ê li vê çolê ji rîna bimirin. Wê qertelên boz goştê me, wê piça goştê mc yê ku maye bbcwe îî wê hestiyen me yên spîboz jî biavêjin nava vê şewatê.

-Wê biavêjin, Husik bi dengekî nerm got.

Mcmcdê ku ji vê yekê hêz stand:

- Ew gund li wir e, binêrin bê çiqasî şênkayî ye. . . Ma dibe ku li wir qet kar tuncbe? Binêrin, ev batoza ha jî diçe wir. Dibe ku nivişte. . . Wê Osiv bimire. . . Wê meytê wî jî bêhn bide. . . Gava ew pale di ber me re buhurîn, we nedît ku wan çawan çavên xwe vekiribîin îî li me dinihêrîn, wilo ecêb, mîna ku ew li heywanan binihêrin, wan li me dinihêrîn. . .

56

Aşik Aîî:

- Gclo çima wan wilo li me nihêrîn?

- Wê binêrin, Husik got.

Ji mêj vc Mcmedê zarok dixwest tiştckî bibêje, lê fikir îî nedikir nikarîbîi bigota. Bi carekê ve pijiqî:

- Ez ji tîna mirim, got. Ew gimdê ha jî bi dar e, çima em naçin wî gundî, dibe ku li wî gundî kar hebe.

- Ma dibc ku kar runcbe, Aşik AJî got. Gundekî ewqasî hêşnayî lê hcbe îî kar lê tunci)e, ma tiştê wilo dibe? Ez ji tîna mirim.

Mcmcd li pêşiya wî dimçşiya, cw rawestiya, li pişt xwe zî-  
virî û bcbawcrî lê nihcrî.

- Ez ji tâna mirim, Ajik Aiî got. Tc çi wilo çavên xwe beioq  
kirinc îi tu ii min diniicrî?

Husik jî rawestiyabû:

- liz wcstiyam, got û bcr bi komck kulîlkên hîro ve meşiya.

Ew hîro di bejna mirovan dc bîin, gidên wê yên pembe  
bi qasî dcstckî vcbûbûn û ji serî hcta binî di toza rê de mabîin.

Di nav kuiîlkcMi iîro de Osiv ji pišta wî herikî )cwarê.

Ycn din jî xwc gihandin ba wan û rûniştin. Di ser wan re  
hin pcrjccwr dcrbas dibiin, tam wan digotin ku ew hênik  
bûn, hcw didîtin ku dîscm roj bi hcmii giraniyaxwe derket ii  
cw ji gcrman pcritandin. Ji tu devcrê, sira bê wnebi. Her ku  
diçii, crd jî dibû mîna sêlckc sincirî. Ji niha pê ve wê meş geickî  
/^hmct bibûya.

Pinpinîkckc şîn xwc ii scr hîroyê danîbîi îi xwe tev nedilivand.

Memcd di scr stîiyê xwe rc zîvirî îi di ber xwe de got, kuro,  
di vê gcrma Xwedê de, li vî cihê ku dilopek av jî lê peyda nabc,  
çi karc vc pinpinîkê hcyc. . .

57

- Binêre, wî got îi niqurçck li Aşik Alî xist, tu ji xwe re li  
vê pinpinîkê binihêrc! Di hundurê vê tenîirê dc, li vî cihê ku  
dişewite de. . .

- Wey lawo, Aşik Alî bi ecêbmayî got, ev ne karê aqilan e,  
hcm jî ev pinpinîk pir mezin e, bi qasî çîkckê ye. . . Kî zane  
bê kîjan bayî ew avêtiye vir.

Husik:

- Pir ccêb e, di vê germa havînê de, cv pinpinîka evqas

mezin. Ew qet tcvnalive. Bclkî jî cw miriye.

- Ew nc miriyc, Osiv bi dengekî bilind got. Bala xwe bidin baskên wê, bê çawan dişewite. Ma ji ku ew miriye?

Peyivandina Osiv ya bi dengckî bilind îî zindîbiina wî, ji ecêbmayînê bctir cw kêficwcş kirin.

- Li vir, li vê jêra ha, di bin zinarên Anavarzayê de pirikck hcyê, ji van pinpinîkan havîn îî zivistanan bi keriyên in.

- Min jî cw dîtîn, Mmcdê zarok got, cw di scr mc rc weke cwrên dihcrikîn. Ew şîrkî biin, mor bûn, dibiriqîn.

AjikAlî:

- Ewrckî şîrkî yc stcrkan diherikî û ber bi zinarên Anavarzayê ve diçî. Hingî cw zinar ji pinpinîkan mor dibîin îî stcrk vcdimirîn. . . Pinpinîkên şîrkî, kesk îî zipîzer. . .

- Ev pinpinîka ha miriyc, Husik got.

Yên din dcng nckirin. Wan ziq li pinpinîka ji gida hîro mezintir ya ku xwc li scr gida hîro danîbû dinihêrîn. Lê pinpinîk tevncdiliviya.

Di ser wan rc çcnd perçewrên din jî derbas bûn, lê wan hê jî ziq li pinpinîkê dinihêrîn.

Memcdê zarok xwe negirt, ya dilê wan got.

-Înşalalî ew nemiriye, got.

Mmcd bêhnekc kîir girt ii berda.:

58

- Înşaleh, got.

AşikAlî:

-Înşaleh...

Husik îî Osiv jî gotin îinşaleh. Kesî bîr nedibir ku rabin ii binerîn bê pinpinîk miriye an jî sax e. Ne ku wan bîr nedibirin,

wan newêrîbîn.

Piştî kêliyckê, gava siya wî ewrê mezin li ser wan rawestiyabîi,  
otomobîlckê toz<sup>^</sup> scr rê ji ber tekerên xwe pijiqand ii buhurî.

Şaxên hîro yên ku di tozê de mabîn, hejiyan. Ew pinpinîka  
şîn jî hejiya lê ji cihê xwe tcvneliviya.

Memcdê zarok:

- Ez ê wc şiyar bikim, got û rabîi ser xwe. Ew radizê.

Hcdîka bi tirs bcr bi pinpinîkê vc mcşiya. Gava ew nêzîkî  
pinpinîkê bii û dcstê xwe dirêjî wê kir, qêrînekê ew di cihê  
wî de sar kir, destc wî jî wisa li hcwa ma. Bi qêrîna Osiv re  
pinpinîk bi qasî bihustekê firiya îi dîsan mîna ku riştekan nebiibc  
xwe li cihê xwc yc bcrê danî.

Bi firîna pinpinîkê vc hcmîi ji kêfan ji cihê xwe hol bîn.

Ûsiv:

- Firiya, bi kcn got.

Ycn din jî:

- Firiya, gotin.

Mcmcd:

- Ew gund bi dar c.

Husik:

- Ew gundckî gclckî xweş c, bi dar ii ber e. Li wî gundî kar  
jî hcyc.

Hemîiyan bi dengckî kar heye, gotin îi bi lez berê xwe bi  
gund vckirin îi meşiyen.

Memedê zarok di pêşiya wan de weke oewrikekî dimeşiya.

59

Li pişt xwe zîvirî îi got:

- Ger em kar bibînin, mafê min. . .

- Hey hustu şikest, Husik bi hêrs got. Hey hustu şikest. . .

- Hêrs mcbe, Memcd bi ken got. Binêre va ye Osiv jî bi ser xwe ve hat.

- Ecêb c, Husik got. Çi bi vî zilamî hatiye?

- Hela hinekî rawcstin, Aşik Alî got. İnşalah Osiv baş bîibe.

-Înşaleh, Mcmed jî got.

Li başîir, ewrên li ser derya spî mezin dibîin îi bilind dibîin. Hêdîka bayek jî dihar îi bêhna )cwêya deryayê dbcist pozê wan. Ew heta bi bazinên lingên xwe di tozê de mabiin, çaroxên wan tijc toz bîibûn, te digot qcy ew di nav xweliyê de dimeşyan.

Gava ew li dor esir gihîştin gund, ew birçî bîibiin, westiyabîin û ji hal dc kcribûn. Şaxên hersê darên tuyê yên di orta gund de, cihekî mezin girtibîin. Li bin dara ortê avkêşeke sor îi mezin, li dor avkêşê jî hewdikên ji kevir hebîin. Binê daran seranser hatibîi avreşandin, îi li binê daran kursî li mîndcr hatibûn danîn. Li dora hcwdikan gul hatibîin çandin, guleke pembe î bi şax vebiibîi ii bêhna wê li bin darên tîiyê belav dibii.

Heta ku ew gihîştin binê daran bêhna wan çikiya. Memcd tavilê xwe gihand ba avkêşê, xwe avêt milê avkêşê yê sor îi av kişand. Gava av ji avkêşê hat:

- Werc Osiv, got.

Osiv çîi ba wî.

- Serê xwe têxe binê avkêşê. . .

- Nabe, Memed got. Nebaş e ku bê ku ew bêhna xwe berde cw wilo avê vocwe. Serê xwe têxe bin avkêşê.

60

Osiv stûyê xwc dirêj kir îî serê xwe xist bin avkêşê, di ser serê wî re ava ku Memed dikişand mîna ava kehniyan dikir bidqînî. Bi carckê ve dilê Osiv şa bii, necweşiya xwe ji bîr kir îî li ber xwc da.

Piştî wî Husik, dîi re Aşik Alî ii Memedê zarok serên xwe danc ber avê. Paşê jî Aşik Alî av kişand îî Memed serê xwe da ber avê. Dawiyê jî kulmên xwe dane ber avê ii heta ku zikên wan ji avê nepixî wan av ve) cwarin.

Gava ew li ser dikika bîrê rîniştin ii der ii dor di ber çav re derbas kirin, ew li çar kalemêrên ku li bin daran bîin, hayê bîin. Ew kalemêrên ha di nav re mêşên ku xwe li ser riiyên wati datanîn diqewirandin û xilmaş dibiin. Li hemberî wan jî pcnc-şçş zarok di nava toz ii hciryê de mabiin, bi qîj îî wîj bi celcbekî lîstika bîlyayê dileyistin. Deriyê hemîi xaniyên kelpîç yên hember girtî bîin. Mirîşk digel çêlikên xwe li ber siyên traktorên rengîn ycn di hewşan de ji xwe re li cihekî digeriyan. Elokeke mezin ya ku bi berkurkeke nepbcandî digcriya, ji bcr çavên Osiv nereviyabii.

Hcta ku bayc csir rabû û ewrên spî yên li ser derya spî bilind bû, cw bi rêz rûnişribîm îî qet deng ji wan dernediket.

Traktor, kamyon, zadçin ii erebeyên hespan di navagund de dcrbas dibîin. Ji bilî van, însan îî heywanên ku di nava gund dc digeriyan, tunebîin. Tc digot qey hertijt di xew de bii.

Piştî hcnkayiya êvarê, çend jin bi satilên xwe derketin îî hatin scr bîrê ii bê ku bipeyivin satilên xwe tije av kirin ii vegeriyan malên xwe. Du hcb ji kalemêrên ku dirêj kiribîin, her yek ji cihê xwe kuxuyan. Di hewşekê de gulên berbiro vebîibîin û berê xwe bi rojê vekiribiin. Roj ber bi ku de biçîiya,

wan jî rûyên xwe bi wê hêlê de ba didan. Her gulek berbiroyê,  
fena siniyekê mezin bîi.

6i

Tam di vê navê de Osiv:

- Ez mirim, bi nalîn got. Ez mirim, min sar e.

Wî xwe ji ser dikikê avêt crdê ii xwe di nava toz ii heriyê  
de vcgcvizand.

- Ez mirim, min sar e, ez qefilîm, goştê min ji hestiyên  
min tê gurandin.

Husik rabii çii ber scrê wî, dcstcn xwc li wî gcrandin îi heta  
ku jê hat şidand:

- Wcha mckc Osiv, wî got. Tu îro hebekî baş bîiyî, te dît  
bê çiqasî kêfa mc hat. Vê bi mc meke, vê meyne scrê me. . .

Ax ii wawcylê li mc.

Mîna ku ii hcviyckc digeriya, çavên xwc beloq kiribîin îi li  
dcr ii dora xwe dinihcrî.

- Wcre serê xwe bide bcr avkêşê, dibe ku bi kêr wcre. De  
were Osiv.

- Min sar e, cz dimirim. . . Ez dimirim Husik.

Husik hcrcs bîi:

- Bimire, bicciicmc, hcre cchcnemc, tcwtewcyê hcram.

Gcr tu weha bûyî, çima tu bi mc rc harî Çûkîrovayê îi bûyî  
beia serê me! Bimirc, bimirc, bimirc, kuro, bicchemc. Hcm  
jî herc nîvc cchcnemê. Tu ii cchcnemê naccmidî.

- Min sar e, cz dimirim. . . Ez dişcwitim. . .

Husik bi hêrs çû li bi avkêşc av kişand.

Ava ku ji avkêşê dihat, dihcrikî dclêv. Wî dcmckê weha  
mîna dêhnan bê rawcstan li bêscbcb av kişand. Bêhna wî di-



çikiya. Paşc hat, mîna ku jê xcyidî be, pişta xwe dayê îî li ba Memcd rîinişt.

Kaiemêrên li ber siyê rabîin îî li ser serê Osiv kom bîin, wan bi şaşmayî li Osivê ku li erdê vedigevizî dinihêrîn.

- Ev ta ye, yckî ji wan got. Tam heft salan ez jî wisa hem ji 6z

serman diriciftm, hem jî ji german dipelitîm. Paşê Göde Mustafa hat îî ez rchet kirim. Göde Mustafa Efendî li hemberî tayê hem kinin belav fikir hem jî efsiin çêdikir. Hem kinina wî li tayê dihat, hem jî efsiina wî. Gava ku didîrin li devcrekê ne kinin pere dike ne jî efsîin, ew dişandin wir. . .

Mêrik her dipeyvî. Baş nedihat fêhmkirin bê wê derê kê derê bil, wî her digot, ger ev zilam negihîje wir wê bimire.

- Wê zilam bimire.

Husik guhê xwe didan wî, bê ku ji gorineke wî bimîne, lê guhdarî fikir.

Hê wilo, li ser serê Osivê nexweş tije jin îî mêr, zar îî zêç bîin.

- Wax, gotin, wax cv çiyayî jî hîç li ber tayê debar nakin.

Em li vê Çîikîrovayê ji heft salî heta heftê saliyên bi tayê ketin îî jê xelas biin, qet ne xema me bii jî. . . Hema ku ev çiyayî carekê bi tayê dikcvin ew dimirin, ha weke vî.

- Canê van çiyayîyan pir nazik e. . . Nedîtine camêran, wê rebcan çî bikin.

- Kar jî nînc, jincke ciwan ku ji girêdana serê wê diyar dibû ku cw bûkckc nû ye, got.

- Ev du-sc sal in ku ev rebenên çiyayî weha dikişin vê Çîikirovayê. Hem ew bi tayê dikevin ii weha dimirin û hem jî

ew kar nabînin ii birçî dimînin. Jinek bi tasek ii bi sê kinina hate ba wan.

- Van hersiyan jî daqurtîne, an na wê li te nebe sibe tu ê bimirî. Taya jehrî tu girtiye, piştî vê tu îflah nabî.

Pîrejinekê got:

- Kurê min, bila hevalên te te bibin wir.

Husik nêzîkî jinikê bîi:

-Ku?

63

Jinikê Husik ji neynûkên lingan hcta porê serî di çav re derbas kir:

- Ma m hcvaiê vî yî?

- Ji roja ku em hatine Çiikirovayê ew ji pişta min neketiye.

Ew li ber mirinê ye.

Jinikê bi milê wî girt û ew xewle kir, di gidiê wî de got:

- Wî bibin wir. Bcrê gava cm bi tayê dikerin em diçîn wir.

- Hîin diçîn ku?

- Rawcstc, meiczîne. Wir... Li binê wir kanîkck dikele.

Rawcstc, mclezîne.

Kççikekc biçûk nêzîkî wan bîi:

- Dara hinarê a ii scr girik, got.

Jinik bi kcçikê re hêrs bû:

- Çavrijiyayê, got. Ma mirov dikare ii hcr dcrê wcha bi dcngê biiind qala wê dara hinarê bike, hcy hustu şikcst! Binê dara hinarê cihê ciiiê şêx û mişayixan c. Hîin werin ba min, hema dinya li mc rohnî bibe, stêrka sihê derkevc, cz ê wî cihê ji we rc biliêjim. Hcma ku hûn bigihîjin wir, wê Xwcdê we

bidc xatirc Şcx li Ewliyan îî hcm ji tayê xclas bikc, hcm jî wê...

Wê mala xwc nîşanî Husik da, di guhc wî dc jê rc got bê divê ew kçngî wcrin îî tavilc ji wir çîi. Piştî kêliyckê ew bi buxçukck nan, bi qîişxancyck savara bi riin û bi şcrbikek dcw vcgeriya ba wan.

- Çiikiirova tijc gawir bûyc. Li Çiikûrovayê însanetî ncmayc. Bcrê jî tuncbîi ya, lc niha hîç ncmaye. Ez jî ji wan çiyân im, birano.

Li pişt xwe zîvirî, dcstê xwe ber bi çiyayê Duldidê ve kir.

- Ha cz bi qurbana wî çiyayî bim, ez ji hesrcta wî çiyayî rc 64

mirim, cz ji wî çiyayê tûj im. Ez ji wê bidiuştê me. Ka riinin ii xwarina xwc bbcwin zarokno, kî zane bê ev çend roj in hiin birçî nc. Ax, gcr çenikek biiz heba îî min têxista nav dewê we. . . Ji xwe li vî feqîrê nocweş binerin. . .

Keçikeke ciwan ku delingekî xweşik lê bii îî xavikeke bi morîk li serî bii:

- Biiz li ba me heye, got îî ber bi malê ve baz da. Ez ê tavilê herim bînim.

Keçik hema ji bcr çavan winda bû ii piştî kêliyckê bi seriyck bîiz vegeriya.

Wan sifre li ser dikikê raxisrin, qîişxane danîn orta sifrê, nan îî kevçî bi rêzê danîn, tas tije dew kirin ii her yeî çend dcndî bîiza ku şikandibiin, xisrinê.

Gundiyan:

- Noşîcan be, gotin, bê deng biin îî vekîşiyân.

Hevalên Osiv ew ji nav tozê rakirin, ew dawşandin, dest ii

scr çavên wî şuftin, pajê cw li ser sifi-ê dane rilniştandin îî  
kevçî xistin dcstê wî. Osiv bcrî ku dest bi xwarinê bike, xwe  
daqûlî tasck dcwê ku hê bûz^ wê ncheliyabîi, kir îî heta qurta  
dawî ew tas bi ser xwe da kir.

Wan di bin awirên gundiyan de )fwarina xwe xwarin.

- Pir şikir, gotin îî ava bîrê di devê xwe werdan.

Qclebalbca gundiyan ya li bin dara tiyê her ku diçii zêderir  
dibîi, bayê xcrbî toza nava gimd vir de û wê de li ba dikir.

Serê banan, dîwarên wan, pcncere ii deriyên wan ji tozê spî-  
boz bûbîin. Pelên darên tiyan, gihayên hişk, erd îî zevî, qir-  
şik, kaktus, hcrtişt di binê tozeke qalind de mabîi.

Qelebalix bêdeng bûbîi îî bi ecêbekê li mirovên dora bîrê  
dinihêrîn.

Memed ji nişkê ve rabii ser xwe, çavên xwe li ser qelebalbcê  
65

gerand, paşê scrê xwe bera bcr xwe dx

- Em ji bo kar harine vî gundî. Ma gelo wê li vî gundî kar  
hcbe? Ev gimd pir bi dar îî ber e. . . Ava bîra we jî cemidî  
ye...

Wî dîsan serê xwe bilind kir îî çavên xwe li ser qelcbalbcê  
gerandin. Deng ji kesî dcrncdiket. Memed çavên xwe bi hê-  
viyekê li ser wan digerand. Kesî ferq nekir bê vê yekê çiqasî  
dom kir. Gundî hêdî hêdî bclav bîin, gava kcs li wir nema,  
Memcd mîna ku biherike crdê, li kêlcka bîrê riinişt.

- Çiqas darcn pir, çiqas mirovên pir, çiqas zeviyên pir. . .

Gava ro çii ava, wan xwe qulipandin vî alî îî wî alî. Kelmê-  
şan mîna ewran bi scr wan de girtin, mîna guran xwe davê-  
tin ser wan.

Husik:

- Li vir nabe, em nikarin li binê vê darê razên, got. Divê cm ji xwe re cihckî razanê, cihekî ku em bikaribin lê êgir dadin bibînin.

Mcmcd:

- Ajik, ji mc rc stranckc bibêjc... Hcta sibehê li tcmbûrê xc, stranan bibêjc.

Gundî ii scr dik ii bana stareyên xwc li dar xistibîin. Bayê xerbî jî dalcctibii û stare hêdî hêdî di bin tava heyvê dc dihejiyan.

- Ma niha wextê stranê yc? Aşik Alî mîna ku bi nalîn got.

- Erê, wexta wê ye, Memed got. Belkî. . .

- Belkî meikiya wê tune. Li vir, li vî gundî kar tuneye.

Heydê cm rabin.

- Ew jinika ji çiyayên me, ya ku )cwarin da me. . . Qîşxane û sifra wê jî li vir in, ma bila ew li vir bimînin?

- Ma cm ê çawan li vir razxn? Ajik Alî got.

66

Mcmcd:

-Bclckî...

Husik:

-Bclckî...

Osiv:

- Em ê sibchê, gava dinya rohnî bibe, dîsan werin gimd, belkî...

Ew rabîin ser xwe, wan sifre, qîijxane îi kevçî dane hev îi derketin derveyî gund, çîin ser girikekî ku ji şewqa heyvê rohnî fikir, gîha dan hev, îi tavilê hestê xwe pê xistin ii dan bin gîhayê. B'i pckctina êgir rc dcngê kclmêşan kê m bii.

- F'z ii serê we bûmc bcla birano. Ez bîime bela serê we. Xwczî cz silichê ncxwçş nckctima. Wcr ku kckê Husik min ii pişta xwc dikc, pişta wî ketc bcr wî.

- Wê sibc Husik tckcvc riya çıyan, Husik got. Sibe hê berî ro dcrkvc. Nc xcr ii van gimdên bêdar heyc, ne jî yên bi dar. . . Hîm li vir bimînin, binerin, wa ye gundekî bi minare xuya dikc, dibc ku ii wir kar hcbe.

Mcmcdc zarok:

- Wc li wir k;ir hcbc, got. Li gundcn bi minare hertim kar hcyc. Ncxwe ji bo çi cw c ii gund minarê çêbikin?

Mcmcd:

- Lawik rast dibcjc, bi ken got. Ai na wê ji bo çi minareke wilo spî û dirçj çcbikin.

- Pir dirêj c, Mcmcdc zarok got. Ew bi şev jî dirêj dibiriqe. Wextî bigihîjc czmanan.

- Ger ew vê Çûkûrovayê gişî li ser navê min tapo bikin jî ez hew li vir dimînim. . . Ez ê sibehê bi rohilat re. . .

Osiv:

- Ez ê jî sibehê zîi bi Husik re. . . Ax, ger ez ne)cweş neke-  
67

vim...

Gava agir kcm dibîi, dixan dadiket, kelmêşan jî fena cenawiran êrîşî wan dikirin.

- Bi vî awayî cm ê hcmîi mîna Osiv bibin, divê sibe êvarê cm têkevin riya çiyê, Aşik Alî got.

-AşikAlî...

- Kerem bikc, kekê Memcd.

-Aşik Alî. . . Ma tu çareyên din henc?

- Na, Aşik Aiî bi ken got.

Paşê jî wî tcmbîira xwe xist hemêza xwe, xwc bi scr dc tewand ii dest pê kir ii lê xist. Li ser gulan, kehniyan, zinaran got. Li scr iicsretc, ii scr zilmê got. Wî digot, hcr kelmêşek wck gurckî ye, didire, pcrçe dike. Wî digot, Xwedayê ku Osiv ji bîrê dncistiyç, ii rûyê me nenihêrî, wê li rûyê mc ncnihêre. Wê hcstiyên mc yên spî li Çîikîirovayê bimîne. Wê kes li scr mc ncgirî jî, wê meytên me mîna yên kîçikan bavêjin kortalekê, digot. Guia me çilmisî, kî dizane wê meytên me ii ku bimînin, digot. Li wir, ji roja pîroz îi bi vir de, cw dara hin;irê li ser wî girikî li ba dibe, digot. Ew dermên dide bidcrdan û kar didc bêkaran, digot. Ji bin dara hinarê ya guisor avcke mîna lampc diicrike, digot.

Heta hi hcrbanga sil)ê, Aşik Alî stran ii çîrokên ncdîtî avêt scr dara liinarc.

Mcmcd jê pirsî:

- Aşik, ma te ev dara hinarç dîtiyç?

- Na, min nedîtiyç.

- Ma te qct bihîstiye?

- Na, min nebihîstiye. Ew gundî hemii dizanin. Ma wê jinika ku xwarin ji me re anî, negor?

- Te, tc ev strana ha ji ku dcrxist?

68

- Min dcrncxistiyç, hcq derxistiyç.

- Ger em wê dara hinarê bibînin wê Osiv jî baş bibe, em ê jî kar bibînin.

- Ez li wê dara hinarê nagcrim, Husik bi hêrs got. Ez ê pijtî kcliyek din têkcvim rê.

- Ka raweste Husik, Ajik Alî got ii dîsan tembîira xwe hemêz kir îî stranak din avêt scr dara hinarê.

Osiv:

- Li Çiikîrovayê herkcs wê dara hinarê nas dikin. Wa mekc Osiv, cv heft sal in ku vê mîrata nocweşiyê di zikê xwe de hildigirim. Ger em dara hinarê bibînin belkî Xwedê şifayekê bidc min.

- Pir kcramctcn daran hcnc, Mcmed bi bawerî ii ji dil got.

Mcmcdê z^rok:

- Kalikê min digot dar. .. Darên wilo hene ku weke ewliyan in. . . Iklkî hcqc min jî bidin.

Osiv:

- Pir kcramctên daran hene. Dibêjin ku kelmêş qet nêzîkê wê darc nabin. Em ê şcvckê li wir, li bin wê darê razên.

- Hiin hcrin, Husik bi hcrcs got. Kuro, ma qet dibe ku li Çûkûrovayê kelmêş tunebin. Ma wê ew dara reben çi bike ji kelmêşan? Hcr yck ji wan wek gurekî ye.

- Tobe bike, Husik, tobe bike, Memed bi tirs got. Nebe, nebe, tu tişteki ji wê darê rc nebêje, tu ê hişk bibî. Ji xwe ocaxa me kor biiye, cm rezîl bîine, tu xwe gunchkar meke, tu ê jî hişk bibî. . . Ji xwc Osiv têra me dike. Binêre Husik, li xwc miqate be, wa meke!

AşikAlî:

- Binêre ha, got. Tu tu bî, tu zimandirêjiya ewliyan mekî, ji xwe zimandirêjiya daran. . .

69

Rabîi scr xwe:

- Divê rêwî di riya xwe de hcrc, îî kcte rê. Hela ka bime-



şin em carcke din jî herin vî gundî, belkî Xwedê. . .

Yên din jî bêdeng dane dîi wî. Gava ew dimeşiyên bayê hênik dilê wan şa fikir, di himdurê wan de dilşahî îî hêvî hêşin fikir. Husik jî li dîi wan dimeşiya.

Ew hatin scr bîrê îî li binê daran riiniştin. Bi carekê ve dcngck ji gimd hat. Gundî hemîi bi hcv re, bi hespên xwe, bi dewarên xwe, bi kerên xwe, bi traktorên xwe, bi ercbcyên xwe yênc span, bi z^dçinên xwe, bi paleyên xwc şiyar bîbîi. Dcng tevlihev bîibiin, dîkan bang didan, kûçik dircyan. Ji cihckî vc jî dcngckî mclîd îî bi hizin yê banga mclê dihat bihîstin. Ew dcmckc li bin dara tîiyê, li scr bîrê rawcstiyên.

- Ew jinika ji Çiyayê Dulduiê, cw jinika qenc dizane, got.

- Ew dizanc, Aşik Aiî jî got.

- Ma çawa cw nizane! Memcdê zarok jî got.

- Li vê Çukuovayê hcrkcs wî cihî dizanin, Osiv got.

Traktor îî kamyon tijc gimdî bîbîin û bi zadçinan re dcrdikctin derveyî gund. Piştî kurtedcmekê dîsan gund di bêdcngiycke kîir dc ma. Ew herçar kal jî dîsan hatin bin daran, gopaiên xwc xistin bin çcngên xwc îî riiniştin.

Çcnd jin hatin ji bîrê av kişandin ii çîin.

- Maia wê jinikê li ku yc?

- Ew c niha werc, Mcmcd got.

- Ew li malê li benda me ye, Osiv bêsebir got. Helbet ew bi tişteki dizane loma wê xwest em herin mala wê.

- Ji xwe bi tişteki dizane, Osiv bi dcngckî bilind got.

70

- Hcydê cm hcrin li mala wê bigerim.

Wan rahiştin sifre ii qîşxaneyâ wê îi li nava gund li mala jinikê gcriyan.

- Ka em mala jinikê ji hinekan bipirsin, Husuk got.

- Mala kê, mala kê?

- Mala jinika ji Çiyayê Diddulê. . .

- Maia wê jinika qcnc, Memedê zarok got.

- Tu kcs li derve tune, tu kes!

Dixan ji banên malan bilind dibî, li baxçe îi li nava zeviyan keldîmanekc tenik difîiriya. Tu nemabii ku serên çiyayên Gawirdaxê yên hember spî bibîna. Nava gund bêdcng biibî, kcs ii dcr ii doran nexuyabîn.

- Mc çima mala wê jinikê ji wan kalan nepirsî?

- Ew nizanin, Husuk got. Ew ê ji ku bizanibin, her yek ji wan hezar salî ye.

Gava çavcn wan ji nişkê vc li jinikê ketin, ew di cihê xwc de sar man.

Jinikê...

- Wcrin zarokno, got, ez ê ji wc re çayê jî bidim ser êgir; cz t; penîr jî, rûnê nîvîfk jî, nanê sêlê jî bidim we. Kerem bikin, werin.

Wan danc dîi jinikê, ew kctin hewşa xaniyekê kelpîçî. Li hewşê, li scr gîhayê sifrcyek hatibîi raxistin, keçikeke ku emrê wê li dor çardchan bû, li scr lingan li bcndî wan rawestiyabii.

Ew li dora sifrê bi xclekî riiniştin, jinikê qedehên bcjinzirav tijc çayê kir, ew bêî ku bipeyivin dest bi xwarinê kirin. Bi tenê dengê cîitina wan dihat bihîstin.

Wan bi lez taştîya xwe xwarin.

Piştî ku Memed devê xwe bi piştî destê xwe paqij kir:

- Me tu kar nedît, got. Tu derê Çîikîrovayê nema ku

71

em lê negeriyar, lê me tu kar nedît xwişkê, ma ev çi bi vê Çîikîrovayê hatiye?

- Ez nizanim, jinikê got. Ev çend sal in ku li Çîikirovayê wisa biiye.

- Çîikîrova tam guhertin, Memed got. Ew xwişka min heye ya, wê qet li rîiyê min jî ncnihêrî. Gayê min yê zer hcbii ya, ew jî ji traktorê re kirine qurban, xwîna wî ya sor rijandinc bin tckerên traktorê. Ew gayê min yê zer hebîi ya, min tam sê saian bi wî cot kiriye. Gava ez çîbîim, rebeno li dîi min giriyabû.

- Ga digirîn, jinikê got.

Husuk bêscbir bîi, bi carckê ve xwe avêt ortê:

- Ew li ku yc, xwişkê? got.

Jinik:

-Çi li ku yc?

- Cihê wê dara hinarê nîşanî mc bide, Husuk got. Belkî ew ji derdê mc rc çarcyekê bibîne. Dibêjin ku pir krametên daran henc.

- I^st e, krametên daran hcne, jinikê got. Gcr cw dar hê li cihc xwc bc.

- Tu tişt bi darckc wisa nayê, Memed got. Tu carî tiştck bi darcke wisa nayê. Tu kcs nikarc tişteki bi darekc wisa bikc. Çîik jî ji ber keramct îi hurmcta wê xwe li scr şaxên wê danaynin, mêş li dora wê nafirin, mêşcn hunguv xwe li ser kuiîlkên wê danaynin. Yê ku bixwaze tişteki bi darê bikc, wê bawî bibc, wc mala wan wêran bibe.

Jinik:

- Dibêjin ku ew dar xeyidî ye. Ji van însanên zilmdar xeyidiye. Dibêjin ew xcyidiye ii êvareke lêxistiye, firiyaye ii Çûye.

72.

- Ew naxeyide, Memed got. Xwedê ew dar. . .

Wî nizanîbii bê wê çi bigota. Gotin di devê xwe de bir ii anî îi dawiyê bi hêdîka got:

- Ew dar naxeyide, ew ji cihê xwe tevnalîve. Ji ber ku hewcedariya însanan bi wê heye. Ma ne ji wê be wê yên bi tayê çawan rehct bibin, wê nexweş çawan zindî bibin, wê karker çawan kar bibînin?

- Ew xeyidiyc, jinikê bi stiixwarî got.

- Tu bi tenê cihê wê ji me re bibêje, Husuk got. Divê em wê darê bibînin, em halê xwe jê re bibêjin. Te divê bila wan ew dar ji kokê de rakiribin, em ê derdê xwe ji koka wê re bibêjin. Tc divê bila wan ew ji kok de rakiribin îi pel û şaxcn wê biribin, cm ê ji cihê wê rc qala rewşa xwe bikin. Tcnê ku em wî girikî bibînin ii em şevê li bin wê darê razên.

- Ger dara hinarê ya pîroz rabîibe û çîibe, ger ew dareke pîroz be, em ê hcrin dîwana wê, em ê dia bikin, derdê xwe jê re bibêjin, cw ê wrc hawara me îi wê ji derdê me re dermanekî bibîne îi gcr ew xcyidî be jî ew ê dîsan bi paş de vegcre...

- Wê werc, Husuk got. Ger ew xcyidî be jî, ew ê dîsan wcre.

- Wê were, Memedê zarok bi kêf got.

- Wê were, ma dibc ku cw neyê? Osiv bi nalîn got.
- Wê were, wê were, Aşik Alî got. Hinarên pîroz, mirovên qenc hertim pîroz îî qenc in.
- Qenc in, pîrejinê got.
- Cihê wê ji me re bibêje xwişkê,
- Ji bo xatirê Xwedê xwişkê, cihê wê ji me re bibêje.
- Ger tu cihê wê ji me re bibêjî tu ê rast herî cunetê.

73

Jinikc da pcşiya wan û cw dcrxistin dcrvcyî gund. Wê bcrê xwe bi kcleha Anavarzayê ve kir îî jêrî wê nîşanî wan da. Dawiya dcşta ku ji gcrman lcy lan lê rabîibii, mîna mijekî sivik daketibii scr deştê, gir îî şikêr û darên li wî aliyc dcşta bi zorê xuya dikirin.

- Hîin ê ji vir di scr Ceyhanê re herin, hîin paşê derkevin scr riycke qîr û zift, hîm c ji wir jî dakevin jêr, paşê hîin c bigiiiîjin gundckî, hûn ê di jorî gund re dcrbas bibin îî bigihîjin ncwalckê. Hîin ê li dora Anavarzayê bizîvirin, hîm ê paşê bi jor vc hilkişin, gava wc dara benîşt ya mczin dît, hûn c li milê rasrê bizîvirin, gava hîin zîvirîn wê crdckc rast dcrkvc pcşiya wc, cw crda rast bi kcvirên ncqîşandî hariyc xcmiandin, bcî ku hiin pê li keviran bikin hîin ê dcrbasî iicmbcr bibin, gava bcrc wc bi quble, bi hêla ku bayc xrbî jc tc û cwrcn spî ic dicivin vcbû, wê cw girikê ha derkvc hcmbcrî wc, gava we girik dît, divê hîin li wir rawcstin, ji cihê xwc tcvmlivin, gava dinya rohnî bibc divê hûn hcrin scr girik û li binê dara hinarc rîinin. Hcydê cm hcrin nialc.

Wc zû da pcşiya wan cw birin maic. Jinik bi iez kct hundur

û hi buxçukekc dcrkct.

- Ha ji wc rc, di nava vê huxçukc de nan, pcnîr û pîvaz.

hcye. F'.v dcr Çûkûrovayc, di riyân dc birçî nemînin.

Mcmcd dcstc xwc dirçî buxçukc kir îi jê stand:

- Xwcdc ji tc raz.î be, xwişk, got. Çi miradê te hebc  
Xwcdc bike.

- Xwcdc bike, Mmcdê zarok jî bi kcn got. Ez ê jî li bin  
dara iinarc dia bikim, ku xwcdîkar heqê min bidin min.

Ez c jî corck ga bikirim, cotck gayên qulonçmezin.

- Ma ku qulonçcn wan nc mczin bin, çênabe? Aşik Alî  
74

pirsî.

- Çêdibe, Memedê zarok bi hêdîka got. Dibe, lê ger qulonçên  
wan mezin bin baştir e, ewê bi heybettir bbcuyin.

- Rast e, Husuk got, ew ê bi heybettir bin. Ger te got  
ga, divê qulonçên wan mezin bin.

Jinik rawcstiyabû, li wan guhdarî fikir, lê tiştê ji wan  
fêhm ncdikir, rûyê xwc diqcrmiçand ii dikeniya.

- Xwişka mc ya xweşik ii mervan, te navê xwe kerem  
nckir, navê tc bi xêr? Ji krcma xwe re navê xwe yê xweş ji  
mc rc bibêje.

- Navê min Ccnct e, jinikê bi şermokî got îi riiyê wê  
mîna yê kcçcke ciwan sor bii.

- Xwcdê rchctiyê bidc tc, xwişka me ya dilovan, Cenet  
Xan.

- Ycn din jî:

- Xwcdê rchctiyê bidc tc, xwişka mc ya xweşik ii dilovan,  
gotin. O bcr bi Anavarzayê ve ketin rê.

Scrê çiyê di nava ronahiyê de mabîi, wê piştî kêliyeke din roj dcrkcta. Scrê çiyayê Duldulê ji niha ve dişewitî, çavcn mirov li bcr vncdibûn.

Gund bi tibabekî li dû wan mabii. Ew bêrawestan dimeşyan, gihîştin ber çemê Ceyhanê.

Memed:

- Piştî ku cm ji avc dcrbas bibin. . .

Husuk:

- Ece bira, em ji avê derbas bibin... Ma tu ê dîsan tişteki bînî serê mc?

- Binêre, ev gundê li hember gundekî pir mezin e. . . Pir mezin dixuye. Belkî li wî gundî kar hebe. Hem jî ew li ser riya meye...

75

Memedê zarok bi kêf:

- Li nava gund spîndarekc bi qasî minareyekê heye.

- Ji minareyekê jî bilindtir e, Husidc got. Wey lawo, min qet darekc wilo bilind ncdîteye.

- Min jî nedîtiye, Aşik Alî got.

- Me riya xwe pê xista, Mcmed got. Em bi niyet in, loma dibe ku dara pîroz xêrekê bi me bike.

- Wê qcnciyekê bi me bike... Husuk got. Hemîi bi hev re li Husuk zîvirîn ii gotin gelo ew henekan dike. Em riya xwe pê xin, Husuk dîsan got. Belî nabe, Xwedayê ku Osiv ji bîrê dcrxistiyc ...

- Wê mc jî ji bîrê dcrxînc, Osiv di ber xwc de got.

Rûyê Osiv hcdî hcdî dihatc guicrtin. Tu nemabîi nobcta wî bihata. Vc ycka hcrtim sibchan dest pê dikir. Osiv jî

an ji gcrman dişcwitî an jî ji scrman diqcîî.

Ecrebcycn hcspan, traktorcn bi crcbcyên naylonî ii kamyon li pcravê kctibCm dorê û li bcnda kciekê biin. Wan keick avêtibiin têickc qaiind, têt jî di çirçirkekc hesinî re hatibû dcrbaskirin. Kcickvanan xwc diavctin têtê îi kclek dikişandin. Hcr gava ku Mcmcd li kclckan siwar dibîi, bêhna spîndaran diketc pozê wî li vê bchnê daristana spîndaran dianî bîra wî.

Gava cw ji kclekc dakctin xwcstin pcra bidin kelckvên.

Yê kcickvan:

- Nc lazim e, ez pcran ji wc nastînim, kclekvên got ii tifeck mezin avêt nava avê. Ez di dc îi xwcha Çûkîrovayê... bi hêrs got. Lêxin herin çiyayên xwe, an na hîn ê hemî li vir bimirin, êdî li van deran xêr nemaye.

- Nemaye, Husuk got. Spas bira.

76

Ew ber bi gundê bi spîndar ve meşyan. Di rê de dîsan Osiv dest bi ricifandinê kir.

- Tu qîmeta wê nîn e, Osiv got. Hiin guh medinê. Çawan be em diçin ba dara hinarê... Binerin, va ye gundê bi spîndar jî xuya dike. Ger me karek bidîta îi ez jî bixebitiyama hingî cz ê baş bibîima. Hertim weha dibe, gava ez kar dibînim ez rehet dibim.

Husuk çend caran xwest Osiv li pişta xwe bike, lê Osiv:

- Nabe, got, cz ê bimçşim, oooy, ez ê bimeşim.

Memedê zarok çû îi kcr bin milê wî. Osiv di)cwest milê xwe ji wî xelas bike.

Mîna ku Husuk kercm bike:



- Bihêlc Osiv, bila lawik têkeve milê te. Lêwik }cwestiye, tu bi xwe nikarî bimeşî.

Osiv deng nekir:

Ew li dor esir gihîştin gundê bi spîndar. Bayekî xerbî yê xurt rabûbii li gund di bin ewrekî tozê de mabîi. Di nava xaniyên gund dc babîsok radibii, ka îî gîha dikişand îî ber bi Dumlukalcyê ve dibir. Ew demekê di bin tozeke qalind de man, dev û pozê wan tijc toz bîi. Wan nikarîbîn çavên xwe vckirana û li derî îî dîwarên xaniyên gund binerîna. Ew bi delkan gihîşrin ber spîndara nava gund. Li binê spîndarê dîsan avkêşeke rengsor hebîi. Gava Osiv gihîşt wir, wî xwe avêt nava tozê, bi hawar ii nalîn xwe di nava axê de vegevizand.

- Heqê xwe helal bikin, birano, ez dimirim. Ez dimirim birano...

Li devê bîrê gidên têvel hatibîn çandin. Hewdikê li ber avkêşê î ji kevir kevnare bîi. Cihê deh peyan tê de hebû. Ew li jêrî hewdik riinişt îî demekê bêhna xwe berdan. Ba-  
77

yê xrbî ku dinya di tozê dc hiştibîi hcr ku diçîi dîntir dibîi.

Wan }cwestin ku cw ser çavên xwe bişon, lê Aşik Alî:

- Ncbe ha, got, em ser çavên xwc neşon, em ê di heriyê de bimînin.

Gava bîi êvar îî ro çîi ava, bayê xerbî kêmbii, bi kêmbiina bê rc jî cw yck bi yck rabîin ser xwe ii ser çavên xwe şuştin. Osiv hê jî li erdê vcdigcvizî. Wan Osiv jî rakirin scr piyan îî ser çavê wî şuştin. Ew li scr bîrê man ii man lê ji gund kcs nchat ba wan. Ji gund jî tu deng nedihat.

Mcmcd:

- Çi bi vî gundî hatiyc?

Husuk:

- Ew licikî ii zo/anane in. . .

AşikAî:

- Ew c niha ji nava crdan wcrin. Hc ro nuh çiiyc ava.

Hc wiio traktorcn bi crcheycn nayionî, kamyon, ercbeyên hcspan û ycn bi peya gundî vcgcriyan malên xwe. Bi carckc vc bû ku tc ax biavêta li crdê nc dikct. Piştî kurtedemckc jî otomobîlck ii bcr bîrc rawcstiya, ji otomobîlê peyayckî dircj î bi sindiclcnc dircj, bi cîzme, bi şewqetareke niczin derckct, qamçiyck di dcstc wî yê rastê dc bîi î ber bi wan ve çû. Hcma cw tavilc rabîm îi kctin rêzê.

- Ma hûn çiyayî nc?

- Bcic, cm çiyayî nc.

- Ma hûn paic nc?

- Bclc.

- Hîin dikarin çî karî bikin?

- Çî kar bc.

- Hîin rojê çiqasî dixwazin?

- Çiqas be xem nakc.

78

Pcyayc awirtii j hcrs bîi, sê caran şîrqînî ji qamçiyê xwe anî:

- Tu hcwccdariya min bi paleyên welê nîn e. Bi çiqasî be wê bixebitin! Rast e. Kuro li xwe binerin, hûn ê ji min re çî karî bikin, hîin ji birçîna bûne mîna segên har.

Aşik Alî:

- Xweşik bipeyive camêr, bi hêdîka got.

Girî ketibî qirikê, hêrs biibii, şikiya bii.

Mêrik bi eynî sertiye gavek ber bi wî ve avêt:

- Wey, gelo ma dilê bçgê min ma?

- Belê, dilê me ma, Aşik Alî got.

Mêrik gavek din jî bcr bi wî de avêt îi destê xwe da tembîira wî. Vingîniyck dirêj ji tembîirê hat.

- Ma tu hozan î?

- Xwedê qismet kiribe, cm welê têne hesêb.

- Tu ê bi kêrî karê min werî, ger tu ji paleyên min re bikî tingîni ez ê pera bidim te, hê bçg efendî.

Mêrik raste rast tinazê xwc pê dikir. Aşik Alî ji dil birîndar bîi.

- Ez naxwazim, tu sax bî.

- Xuyaye dîsan dilê te ma.

- Bclê, dilê min ma.

- Kuro çi dilê tc dimîne, rojê panzdeh mitirbên mîna te li bcr deriyê min in...

Memed bi serbilindî îi bêxem gotin ji wan girt:

- Ev Aşik Alî ye. Kurê Aşik Husên e. Nav îi dengê wan li van deşt îi çiyar hemîyan belav bîiye. Navê kalikê wî jî Afik Xalid e, navê wan heta bi Avşarê çiiye. Bavê wî jî Dadalogluyê mezin e. Aşik Alî ji sulala Dadaloglu ye. Ev tewra te ne qenc e.

79

- Kuro, mêrik got, çiyayiyê pîs, tu ncmayc tu sulala wî bigihîni Osmaniyan, tu wî bikî mcrivê Mustcfa Kemal.

- Ew ji sulala Dadaloglu yç, sulaleyckc pîroz e.

- Te got ew ji sulala kê ye?

- Jiya Dadalogluye.

Mêrik bi pirqînê kcniya.

- Dadalogiu. Kî ye ev Dadaloglu? Ma ew hozanckê mitirb c, kî ye?

Aşik Aiî ji licrsan dilerizî.

- Hiş c! Mmcd, bi qêrîn got, peyva bi vî mêrikê re heram c.

Mcrik jî qîriya:

- Hîin çi nc kuro, parsckno. Hûn kî...

Di vê navê dc çcnd gundê jî hatibiin ba wan.

- Ka rawcstc, axa, yckê got îi xwcst wan navcê bikc. Ka rawcstc axa, ma cv ji ku dizanin tu kî yî. Ma ger cw zanibin tu kî yî cw dikarin li ba tc bchsa sulalan bikc?

Mcrik bi acizî bcrc xwc guhcrt.

- Ji wan rc hcjc bc cz kî mc. Dadalogiu ye! Dadalogiu pîroz c, ji suaia pîrozan c! Kuro ger tu ji sulalckc pîroz î, wê çaxc tu çima ketiyê vî haJî. . .

- Me çav bera maic kesê ncdayc, Memcd got. Em li kar digcrin, cm bi kcda xwc dixcbitin.

- Wê çaxê çi karc wc ii vir hcyc csiizadcyên min? mêrik dîsan bi qcrf got.

Ew paşê zîvirî scr gundiycn li wir. . .

- Van çiyayiyen taviiê ji gund dcrxin! Ji niha îi pê ve jî qct çiyayiyen ncxin nava erd. Kuro bijê ev traktor, bijê zadçin! Kuro em hew dikarin ji ber van esilzadeyan bikin dcr! Kuro, wcy esilzadeyin min wey! Ji sulala Dadal mada-

80

lan in... Kuro bijî Maraşal Marşal...

Ew li otomobîla xwe siwar bîi:

- Van ji gund derxin, zîi, taviî. Ew ê îşev têkevin malê malên me jî, lê wê haya me ji wan çê nebe. Diz di ser van re tune... Min ê nîşanî we bida. .. Bişêkirînin ku karê min heye. Divê ez we li vir nebînim. Ez ê piştî nîv saeta din vegerim, gcr ez we li vir bibînim êdî hiin texmîn bikin bê wê çî were serê we.

Otomobîl şixulî.

Gundiyan:

- Xwedê hiin ji destê axê xelas kirin, an na ew ê li vê meydanê bi qamçiyên bikişiya ser we, wê hûn perçe bikira. We axa pir hêrs kir. Ma mirov welê li hcemberî axê dipeyivc? Eman ha, cman, hcma têkcvin rê ii herin... Ew ê piştî kêliyckê vcgerc, cw wc li vir nebîne jî ew ê têkeve dîi we îi gcr wc bigirc wê têra we li we bbce. Ew axayekî gelekî baş e, lê cv xuyê wî nc baş c. We şaşî kir, ger hîin li ber wî rancbûna wî ê kar bida we. Niha têkcvin rê ii herin, nebe nehe, hîin di rc de jî merin, çolbeyar herin, ger ew we bigire, bi Xwcdc wê we bi qamçiyên bikuje.

Wê Mmcd bipcyiviya, lê Aşik Alî destê xwe da ber devê wî, bê ku ew tiştêkî bibêjin ketin bin milên Osiv ii ketin rê îi çîin.

Husuk diranên xwc diqiriçandin.

Gava ew ji gund dcrketin, Aşik Alî:

- Em di rê de neçin, Xwedê bela xwe bidiyê, bela wî li ber deriyê wî be.

- Em ê di rê de herin, Husuk got. Ger ew mêt be ew ê

were.

- Sîleha me nîne, Memed got. Xwezî demançeke me he-

8i

bîiya.

- Baş e ku nîne, Aşik Alî got.

- Xencera min bi min rc ye, Husuk got.

- înad mekc Husuk, Aşik Alî got. Ji xwe tiştê hatiye serê me besî meye...

Dengê wî ewqas êşdar îî belengaz bîi, ku Husuk tişteke negot, gava wan dan nava erdan, cw li ber Osiv rînişt:

- Werc Osiv, li pişta min siwar be, got, îî wekî din jî hew tişteke got, gotin ji devê wî dcrneket.

Ji dîir ve dareke mezin xuya dikir, wan xwe li darê girtin.

Heyv dcrkctibîi û biiind bîibû. Zinarên Anavarzayê ji vir mîna rojê xuya dikirin, baskên xwe vekiribîi îî mîna çîikeke pîroz dixuya. Ji gundên dorliêlê ji dcngên çend segan pê vc tu dcng ncdihat.

Wî axayê ha jî çavcn makîncyên xwe dabîin rê îî bi kamyon, zadçin û traktorên ketibû rê.

Gava ew gihîşt bcr darê, ew ji hal de ketibîin, hema wan xwe avêtin bin darê. Ew qct nepcyivîn. Ji kesî dcngck, pêjneke nedihat. Dengê naiîna Osiv jî nedihat, wî xwe mîna miriyckî ii crdê dirêj kiribû. Ji roja ku ew dakctibiin Çîikirovayê, cv cara pêşî bîi ku dilê Aşik Alî dibijiya cigareyekê.

Ax, ger niha cigareyck iiebîiya îî Aşik Alî dixana wê bikişanda kczeba xwc, bikişanda, bikişanda û bikişanda.

Wan nc agir dadan, ne xwarin hat bîra wan, ne jî guh dan ewrê kelmêşên êrîşkcr. Ew heta sibehê, bêî ku xew tê-

kcvc çavên wan ii binê darê dirêjkirî man. Gava refek çîik di scr wan re derbas bii, wan hingî serê xwe rakirin î li esmanê ku hêdî hêdî rohnî dibîi nihêrîn. Rojê dabû serê Gawirdaxê ii scrê çiyê dibiriqî.

8z

Mcmmed bi bcjna xwc ya dirêj rabii ser xwe î bi pişta destê xwe çavên xwe paqij kirin, yên din jî çîin ser cihokê î dest î ser çavên xwe şuştin. Pajê li hev kom biin î bi hev rc bcrê xwe bi çiyayc Diddulê ve kirin. Rojê dabîi scrê çiyayê Diddulê, serê çiyê di şewqê de mabii, ew mîna stêrkekê dibiriqî.

Osiv vê sibchê jî baj bîi. Ew nc ji sermayê diqefilî, ne jî ji germê dipertî. Wan nikarîbûn li riiyên hev binihêrîna. Herçî Memcmmedê zarok bîi wî qet serê xwe hilnedida jor. Wî bi salan li bcr deriyê zalimekî kar kiribîi, wî zalimî hemî pereyê ku wî hcq kiribîi xwaribîi, lê kesî mîna yê do erza wî ncşikandibîi. Her ku diçii derdê di hundurê wî de diîê wî diêşand û nizanîbii wê çi bikira. Gava wî zilamî erza wan dişikand, Mmcd dibîi mistek, Husuk di riinê xwe dc diqijîi, Ajik Alî ji jcrman dixwest têkeve binê erdê, dcngc nalîna Êsivê ku li crdê û di nava tozê de vcdigevizî bCdiû mîna qcrînekc û diêşiya. Ew hatinc vî temenî lê heta niha kcsî bi vî awayî crza wan ncşikandibii. Wan dixwestin hcrin scrê zinarê Anavarzayê, li wir têr bigirîn ii paşê xwc biavcjin dcvê zîhayckî merivxur. Ma cw hctanî sibehê li ser mcrikê xwcdiyê otomobîlc ii li ser wî gundî çi nefikirîbûn... Ew di nîvê wc dcşta han dc rawcstiyabiin. Memmed stiiyê xwe yê dircj bi vir de î wir de dizîvirand, mîna ku li tiştekî digere

lê nabîne. Te digot aqil di serî dc namabii. Yên din jî lê ccêbmayî mabûn îî ziq lê dinihêrîn. Memed demekê rawestiya, mîna tiştê ku lê digeriya dîtibe, riiyê wî geş bîi. Gava yên din çav li nigeftiya wî ketin şewqek di riiyê wan de jî pê ket. Piştî ku Memed bi riikenî li wan nihêrî, berê xwe bi zi-  
83

narên Anavar7.ayê ve kir îî meşiya. Yên din jî keniyana îî dan dii wî. Memcdê zarok demckê di cihê xwe de rawestiya, serê wî li erdê bii îî difikirî. Pajê wî ji nişkê ve serê xwe ji erdê rakir, rabîi ser xwe, reviya ii gihîşt wan.

Gulên hîro yên şîn, şîrkî îî sor mîna bejneke bilind bîibîn.

Wan di nav firêzc îî erdê birincê de xwe di ser cihok îî kortalan de hol kirin ii danê nîvro gihîştin binê Anavarzayê.

Ji rîna germê, tozên li ser rê bîibîn mîna xwcliya firnan.

Wan nikarîbîn çavên xwe li ber Zinarên Anavarzayê ku ji ber şcwqa çemê Ceyhanê dibiriqî, vekirana. Çem li vê derê bêdeng, mîna pêlcke şewqê deşt dadigirt îî diherikî.

Ew ji dîir vc çav li kcskahiycê, çav li bîstanekî kesk ku taviiê hundurê mirov hênik dikir, ketin. Ew di xwêdanê dc mabûn îî hcikcheika wan bii. Wan ji nişkê vc bcrê xwc ji bîstên guhertin îî li Osiv nihêrîn. Ew îro hê ncxwcş nekctibû.

Wckî din hcr sibeh bi rohilat re wî xwe davêt erdê ii digot: "Ez dişewitim, ez diqcfilim". Ew bê ku tiştckî bibêjin

wan rast berê xwe dan bîstên. Ew bê armanc diçîin

nava bîstên. Hema wilo ji diiê wan hat, mîna yê çîikan.

Di vê dcşta sincirî de mirov, heywan, çîik, minminîk, bê hemdê xwc xwc davêtin nava vî bîstanî.

Wan ncdixwcstin cw iicrin scr çcmê ku hemîi şewqa



dcştê dicivand û dida çavên wan, cw jê direviyan, iê wan berê xwe didan vê mcydana kcsk. Heta mar û kêzik û kurmikan jî xwc didan rcxê vê şînkahiyê. Bi hezaran hcchecî-kan baskên xwe li hev dbcistin, mîna rîrê difiriyan, li scr bîstên digcriyan û carna jê didan dîi ewrên mêşan. Ew hatin ber bîstên îi li kêleka hev rawestiyan. Bêhna leman, bêhna şcbeş îi petêxan li pozê wan xist. Wan ew bchna ha kişandin hundurê xwe. Nava bîstên bédeng bû.

84

di nav lcmên mezin dc şcbeş îi petêx li ser hev bîin. Lemên petêxan heta dêliya li rexê bîstên bîi. Peyayekî ku li bih siya holikê razayî bîi li ber çavên wan ket, lê ma wan ê çî bikirana ji mêrik.

Husuk:

- Gelo ma cm herin bin siya wê holikê wê ne baş be?

Memed bédil:

- Ma çî karê me li wir hcyê? Ev mirovên vê Çiikîrovayê eccb bîine. Werin em li vir riinin îi zikê xwe dagirin, got bi milc wî girt îi cw kişand. Heydê em li vir rîinin.

Osiv çerm îi hestî mabû, bi rûyê xwe yê dirêj îi zipîzer:

- Kî zane, got ii bişirî. Diranên wî spîboz îi dirêj biin.

Kî zane bê bin siya wê holikê çiqasî hênik e. Binerin, li binê holikê jî peyayck heye.

- Ma ger pcyayckî biçîik li wir hcbe, wê çî bibe? Ka bincrin, wî tivinga xwc jî bi darê holikê ve bi dar ve kiriye.

Ka çavên xwc baş vckin îi iê binerin.

Osiv:

- Yanî biçûçik c, dibc ku jî zarokek be. . .

Aşik Aî bc ku bipeyive xwc di ser cihokê re hol kir û ber bi hoiikê vc mcşiya. Yê din jî piştî dudiliyê dane di wî.

Gava Aşik Alî gihîşt ber holikê:

- Selamuelcykum, bi dengekî bilind got.

Peyayê ku li binê holikê razayîbii hol bii ser xwe ii,

- Elcykumeselam, got.

Dilşaliî ji rûyê wî difûriya. Wê yekê dilê Aşik Alî jî şa kir.

Em ji germê gêj bîne birawo, bi destîra te be em nanê xwe li binê vê holikê bixwin.

Yê li ber bîstên:

85

- Kerem bikin, kerem bikin, sî ya wc ye, kerem bikin, got ii cih da wan.

Mêrik ewqasî ji dil bî ku ew şaş ii ecêbmayî man.

- Di vir re werin. Binê wê giha hêşin herî î çirav e. Xwe di ser vir re bavêjin.

Pêşî Aşik Alî ii paşê jî yê din xwe di ser wî cihê ku mêrik got re avêtin î ketin binê holikê. Gava bayê hênik li rCiyê wan kct taviî dîşaliyekê ew girtin.

Mêrik ji wan rc mcrşek li binê holikê raxist:

- Hîin bi xêr ii silamet hatine, kcrem bikin rûnin.

Yê din:

- Xcra Xwcdê li te bc, gotin, lê bîr nedibirin ku li scr mcrşê rCmin.

- Kcrem bikin birano, nîinin.

Dcngê mêrik bi kêf li cşq bî. Yê din jî li wir rawestiyabûn ii ccêbmayî mabûn. Aşik Aî çî ii crdê riinişt. Mêrik

xwc avêt miiê wî û got:

- Li vî cihê şii rnûncnî birawo, li ciiiekî ziwa rCme, tu ê ncxwçş bikcvî...

Mcrik bi kujckî merşê girribîi îi bcr bi wî vc dikişand.

- Hîin bi xcr û sclamct hatinc birano, hiin ser scan îi scr çavan hatinc.

Li ycn din zîvirî:

- Kî zanc bc hîin niha çiqasî li bcr vê tavê şcwitî nc, kî zanc bc hCm niha ji ku tèn, kî zane bê hCm niha çiqasî westiyayî ne, kî zane. . . Ka riinin û bêhna xwc berdîn. Kî zanc bc iiûn niha çiqasî birçî bCme. Hcla ka rîinin, ka hebckî bêhna xwe bcrdin ez ê ji wc re tişteki. . .

Mêrikc ku ji kêf û şaliiyan diftûriya bi telaş dixuya. Yêndin jî dcrbas bûn û li ser mcrşê, li kêleka Aşik Alî riinişrin.

86

- Navê wc bi xêr?

- Yê min Aşik Alî, Aşik Alî got.

- Ma tu hozan î?

- Xwedê qismet kiribe.

- Dêmek tu hozan î. . .

- Ev heye ya, ev ape Aşik heye ya, ew bi stranên xwe lalan bi ziman dike, miriyan sax dike, çiya ii zinaran dihelîne. Gava apê Aşik dest bi stranan dike, kulîlk, çîik îi dar bi ziman dibin, heta ax jî bi ziman dibe. Ma li van zirecêbên çiyân, li Torosan, li Aladaxan, li Binboxayê, li Gawirdaxê yêndin ku navê apê Aşik nebihîstibin, heye. Gava navê Aşik Alî tê zimên zarokên di pêçekê de jî haj dibin, ava çeman disekine.

Bi carckê vc:

- Hişe Mcmedê zarok, Aşik Alî bi sert got.

Ew paşê zîvirî scr mcrikê bîstanvan:

- Mcmcdê zarok ji xwe wilo dibêje, em li ku dengbêjî li ku...

Mcmcdê zarok coş bûbî:

- Ez rast dibêjim, Memcdê zarok bi dengckî bilind got.

Hem jî apê Aşik Alî hozanê heqiyê ye.

- Hişe Mcmcd, Aşik Alî mîna ku pê şa bibe, got. Hişe lawê min, bes e.

Paşê Aşik Alî ji mêrik li ber bîstên re got:

- Dc ka tu jî kerem bike ii were li ba rîne.

Mêrik:

- Ser seran Aşiqê min, got ii li ba wan riinişt îi çarmêrkî veda.

- Tu jî wî navê xwe yê xweş ji me re bibêje mêrê çê, peyayê qenc, zilamê çavfireh, birayê min yê bîstanvan, Aşik  
87

Alî bi çavên hêsir got.

-Ji min re Ehmcd, dibêjin, Ehmedê Şamam.

-Wey tu bi xêr û selamet bi vî navî bijî birayê me yê çê.

- Navê min jî Husuk e.

- Yê min Memcd e.

- Navê min jî Memed e, lê ji ber vî apê Memed ji min re dibêjin Memedê zarok.

- Navê min jî Osiv e.

- Ew pir nexweş e, Mcmedê zarok got. Bi tenê ew îro bi tayê neketiyc. Ew wilo bi tayê dikeve ku li nava tozê, li

nav herî îî çiravê vcdigevize îî çavên wî beloq dibin.

Memcd pcyva wî birî:

- Ger cm kar bibînî îî xwcdiyê kar hcqê Memedê zarok bidiyê, ew ê ji xwe rc cotek ga bikire, cotek gayê qulonç-mezin, ha qulonçên wilo mezin, wck dasan.

- Erê, ez ê cotck gayên qidonçmczin bikirim, Memedê zarok got.

Ehmedê bîstanvan kctc telaşê îî taviê rabîî ser xwe:

- Wey li minê, niha hîin rî îî birçî ne. Wcy bêaqiliya min! Binerin, ha li vir bîrcke min heye, ava wê wcke bîizê Wî bazda, çîi dewl avêt bîrê, kişand ii ji wan rc anî.

- Kerem bikin, vcxwin, got.

Wî pêşî dcwl dirêjî Aşik Alî kir.

- Ez hcrim ji mêvanên xwe yên hêja re )cwarinckê hazir bikim.

- Em jî dikarin alîkariya te bikin, Husidc got. Tu xwe mewcstîne, mirovê çê.

- Ez nawesrim. Hiin bêhna xwe berdî. Ji xwe xwarin hazir e. Ez ê ji we re a niha bi bamya re savarekê jî çêbi-  
88

kim.

- Tu meweste birayê hêja, Memed jî got.

- Tu xwe mewestîne, Memedê zarok jî got. Tu xwe mewestîne peyayê Çîikîirovayê yê herî qenc. . .

- Tu meweste, Aşik Alî jî got.

Mêrik darikê kibrîtê da bin qirşikên ku di kuçik de hazir

bii. Bii qirçç qirça qirşikan îî agir pê ket. Wî av, savar îî

xwê xist qîşxana li ber xwe ii ew danî ser êgir ii ji wir vekîşiya

Îi li wan nihêrî. Li wan dinêrî ii bi kêfdikeniya. Carinan di nav re xayiz dibîi, lê dîsan bi dilşahî dikeniya.

- Ka bila ev bikele. Wey li minê, a ez ê niha ji we re petêx îi şebeşên cemidî bînim. . .

Hcma wî ji cihê xwe baz da îi çii çend petêx îi şebeş ji leman kir, ew xistin hemêza xwe îi vegeriya ba wan. Lê petêx ii şebeş ji hemêza wî dişemitîn erdê. Memedê zarok ii Memed bi bazdanê çiin alîkariya wî:

- Tu meweste bira, gotin, îi rahiştin petêx îi şebeşan îi bi hcv re meşiyar binê holikê.

- Ma kêr bi we re heyc?

- Belê, heye, Husuk got.

- Ji xwe re bişkînin û bixwin, Ehmed got. Pir cemidî ne.

Roj xwe nagihînc binê wan dcviyar, şebeş pir cemidî ne, diranên mirov dêşîne.

- Spas bira, Husuk got îi xencera xwe ji ber piştta xwe kişand. Xencer neqîşandî, dudevî ii ya çerkezan bii. Doxa wê jî ji qîlên fîlan bii îi neqîşandî bîi. Gava bavê wî li Sarikamîşê şer kiribîi, ew ji ber piştta rîisekî kuştî derxistibii.

Her tiştê wî ev xencera wî bîi. Gava Husidc şebeş dîlim dikir,

Memedê zarok çavên xwe beloq kiribîin îi li xencerê

dinihêrî. Wê rewşa wî bala herkesî kişandibîi. Gava Hu-

89

suk dîimck şebeş jê kir îi dirêjî Memcdê zarok kir, hingî

Mcmcdê zarok veciniqî ii ew dîim ji destê Husuk giri:.

Gava ew şebcş xelas bii, Husuk yê din jî şikestand îi ew jî

xelas bîi yckî din şikcstand... Paşê dor hat petêxan. Ji roja

ku cw hatibîin Çîdcirovayê dcvê wan bi dîlimek petêx îi

şbcş ncbîbîi. Lêbclê bîstan tije petêx îi şebeş bîin. Bi rasrî mîna ku Ehmedê bîstanvan gotibii, petêx îi şebeş wek bîzê bûn.

Hcta ku Ehmed bi kêf got, savar keliya, wan petêx îi şebcs xwarin û hcta qaşiiên wan jî kotin. Li der îi dora holikê, mêşên hunguv bi refan difiryan, baskên wan ji rîrêjên rojê şîn û kcsk dibiriqîn û dcrbas dibîin.

- Savar kciiya, min vc sibchê jî bamye çêkiribîi, dewê wek qeşayê jî hcyc.

Memcdê zarok bcr bi wî ve bazda, Aşik Aiî jî. . . Wan qûşxanc û sifra ku nanê sêlê tê dc bîi, anîn îi li binê holikê raxistin. Gava wan qapaxa qîşxanê hilanîn, bêhneke xweş ya riinc nîvişk jê ftiriya.

- Kcrem bikin birano, noşîcan be.

Ehmed kcvçiyê pcşî di savarê da kir. Paşê jî Aşik Alî.

- Te pir xweş çêkiriyc kckê Ehmed, destê te sax bin, Xwcdê bidc xêra miriycn te.

- Spas Aşik.

Yên çiyayî kişyan ser savar, bamya îi dew. Wan ji mêj vc xwarincke wilo bi iezct nexwaribûn. Bêî ku bipeyivin wan xwarina xwe xwarin û têr biin.

Eiimcdc bîstanvan:

- Ka hiin bîskê ji xwe re li vir razên. Ez ê êvarî jî ji we rc...

Ji nişkê ve vcciniqî, rawestiya, ber çavên wî reş biin:

90

- HCm êvarî jî li vir in, ne wilo?

Bi bcrgerîn li çavên Aşik Alî dinihêrî.

Aşik Alî fêhm kir:

- Em li vir in, em li vir in, bi lez bersiv dayê. Ma em ê herin ku, em li vir in. Em ê sibehê tê kevin rê îî herin wir.

- Wir, ku ye?

- Em lê digerin.

- Li kê?

- Em li dara hinarê ya li ser girikê spî digerin. Te qet navê wê dara hinarê bihîstiye? Ew pîroz e. . .

- Min qet nebihîstiye, Ehmed bi stîixwarî got. Ma hîn ê çi bikin ji dara hinarê?

Rengê rûyê Aşik Alî hat guhertin:

- Osiv pir nexweş e, bi dengê şewat got. Ew nocweşê mirinê yc. Ew tcnê îro baj c. Tu ê bibînê bê ew ê sibe çawan bibe. Em ê ji bo wî ji wê darê şifayê bixwazin. Ew dara pîoz ji her derdî re dcrman c.

Memedê zarok ji nişkê ve got:

- Ew dara ha, cw dara ha wê kar jî bide me, bi bêhnçikiyayî got. Ew jin hcyê ya, cw jina ji vî gundê bi dar. Wê jina ji çiyayê Duldidê, ha wê jinê got. Wê got, ger hiin herin ii hiin wê dara hinarê bibînin, ew ê gelek pere jî bide we. Ev sê mehên me ne ku em tî îî birçî li Çîdcîrovayê digerin.

Kes pariyê nê nade me. Heta xwişka apê min Memed jî tu kar ncda mc, wê erza me şikand. Her kesî em...

Do zilamekî ji vî gundê em. . . Ji Aşik Alî re jî. . .

Husuk bi hêrs çavên xwe bcloq kirin, lêvên wî lerizîn:

- Hişê kuro kîiçikbav, bi hêrs got. Kîiçikê zimandirêj...

Memedê zarok ji ber dengê wî lerizî.

Ehmed rabîî ser xwe. Ew bejinkurt bîî îî di çavên wî de



xemgîniyek hebîi, xemgîniyeke welê ku te digot qey wî hîç dawî neyê.

- Hiin razên. Xuyaye hîin ê sibehê li vir bin? Baş e, belkî sibe jî... Belkî ez yekî ku cihê wê dara hinarê dizane bibînim.

- Bibîne, bira Osiv bi coş peyivî. Ji kerema xwe re bibîne da Xwedê me ji van derdan xelas bike.

- Hîin bêhna xwe berdin, razên. Ez ê ji we re êvrî. . .

- Xwedê ji te re razî be, bira.

Ehmed ket nava bîstên ii pê re mijîl bii. Wî bi qasme cihok vedikir ii av berdida ser bîstên. Ev karê wî heta bi esir dewam kir. Yên din jî xwe dirêj kiribîin, lêbelê xew nediket çavê yekî jî ji wan. Ew qet nedipeyivîn jî.

Gava dengê Ehmed hat, Aşik Alî rabîi ii li ser xwe riinişt.

- Ma ez ji we re tirşikê çêbikim, Ehmed peyva xwe dubare kir.

- Birayê Ehmed, Aşik Alî got. Xwedê tu derdî nede te.

Ma gelo em nikarin alîkariyekê bi te bikin. Em pênc peyane.

- Ma hiin ê alîkariya min î çî bikin, tu kar nîne ku. A va ye min devê cihokan vekir ij wê niha hemîi bîstan were avdan.

- Bêhneke pir xweş tê, Aşik Alî got ii pozê xwe bilind kir ii bêhn kir.

- Gava bêhna erda avdayî tevlî bêhna bîstên dibe hîn )cweştir dibe.

- Pir xweş bêhn dide, Osiv got.

- Çi bêhneke xweş, Memedê zarok got ii pengizî ser xwe.

91

- Çi bchnckc xweş yalio, li vê Çîikûrovayê çi erdên bi bereket hene.

- Belê, henc, Memed got.

Siha bîhê ber bi rohilat ve çîibii, rojê dabii binê dara bîhê.

- Roj hatiye ser me.

- Biia were, Memed got.

- Ji berdêla ku em xwe wisan bi tiralî dirêj bikin, qet nebe me alîkariya vî zîlamî bikira.

- Em bikin, Osiv got.

- Ew tişteki ji me naxwaze, ew bi tenê dixwaze ku em çend rojan li ba wî bimînin, Aşik Alî got.

- Ma em dikarin bimînin? Husuk pirsî.

- Em nikarin bimînin, Aşik Alî got. Divê em wê dara hinarê bibînin.

- Ger em wê darê ncbînin nabe, Memedê zarok got.

Gava em wê darê bibînin, wê çend daxwazên min jê hebin...

Ew çîi ba Ehmedê ku bacan diçinîn û dixistin selikê.

- Gcr em wc darê bibînin, ez ê ji wê darê tişteki bbcwazim ku...

- Tu ê ji darê çi bixwazî, bêî ku Ehmed serê xwe rake jê pirsî.

- Ez ê çi bixwazim? Bincr kekê Ehmed, biner, ez ê ji te re bibêjim bê ez ê çi bixwazim. Ez ê ji gulên sor yê wê darê bixwazim ku ew vî gundê bi spîndar bişewitîne ii ez ê jê

bixwazim ku ew wî peyayê bi otomibîl jî bikuje.

- Ma wî zilamî çi kiriye ji we?

- Ji me re xeber da. Aşik Alî hozanê heqiyê ye. Ji wî re jî, ji tembûra wî re jî, ji stranên wî re jî xeber da. Ger ew  
93

dara hinarê wî nekuje. . . Ez ê wî. . .

- Ma tu dêhn î? Ehmed bi dengekî sert çii ser.

Memedê zarokê ku têgihîşt ku xwe daye dest:

- Min henek kir, kekê Ehmed, got. Ma ez ê ji ku wî gundî î wî zilamî bibînim... Ma tu ê bikaribî ji me re cihê wê darê bibêjî?

- Ka hela hîin çend rojekî li vir bimînin, bêhna xwe berdin, ez ê ji camêrinan cihê darê bipirsim.

- Cihê wê qet mepirse, Memedê zarok got. Ma qet dibe ku ew dar tunebe? Wê jinika ji çiyayê Duldulê ji me re got.

- Ger dareke weha hebe, ez ê jî ji we re cihê wê peyda bikim.

Bi benê holikê ve îsot, bamya î bacan hatibûn daliqandin.

Memedê zarok li dora holikê diçû î dihat, hcr tişt, hcta gêrik û kurmik jî di çav re derbas dikirin. Wî li her tişrî dinihêrî, şebeş, petêx, xiyar, kundir, firingî, her tişt di çav re derbas dikir û diçû vî serî û wî seriyê bîstên. Minminîkên mezin yên şîn, şîrikî, sor li nava bîstên digeriyan.

Şebeşên mezin î belek bi leman ve li ser erda nerm xuya dikirin.

Memedê zarok li rex cihokê tam şeş hêlînên çîdcan dît, di her hêlînê de jî sê hêkên pitikpitikî hebû. Gelo çûkên

van hêlînan çûbûn ku? Van hêlînan jî ew newerqiland.  
Derdekî mezin di hundurê wî de hebû, wî bi xwe jî nizanîbû  
bê çi derd e. Derdê ku giriyê wî dianî, dilê wî teng  
dikir, nedihîşt ew di qalikê xwe de hilê çi bû gclo? Wî ê  
çawan li rûyê hozanê heqiyê Aşik Alî, Memedê dirêj û  
xun:, Husukê bêhteng û ji xwe bawer û Osivê li ber mirinê?  
Wî ji her tişrî şerm dikir. Ji ava ku vedixwar, ji nanê

94

ku dixwar, ji minminîkan, ji çûkan, ji kêzik îi kurmikan,  
ji her tiştî şerm dikir. Wî nikarîbii li aliyê gundê bi spîndar  
binihêriya.

Ehmed agir dada, bacan, îsot, firingî, xirtik, hiir kirin,  
bamyâ nçqand, pîvaz hiir kir îi hemii xistin bcroşa bi tcnî  
îi danî ser êgir. Yê din jî bi siya bîhê re çîibiin tê serê bîstên  
îi li scr timikekî rûniştibiin. Gava Ehmed agir dada,  
ew jî rabîin scr xwe. Ji xwe gcrmî êdî hebckî tcmirî bij,  
ewrên spî bêtir nçpixîbûn, û hênkahiyê hêdî hêdî ew deşt  
hemii dixist bin tesîra xwe. Aşik Alî li pêş, Husuk li dîi wî  
îi li dîi Husuk jî Memed ii Osiv kcrin nava wcrz. Wan  
hertiş di bcr çav rc dcrbas dikirin, petêx, şcbeş, gul ii kulîlk,  
li hcrtiştî diniiiêrîn. Di scr wan re jî bêrawcstan siya  
ewran dcrbas dibû. Li nava crdê birincê yê li hemberî wan  
bi sedan lcgicg li scr iingckî rawestiyabîin. Mcmcdê zarok  
ji cihokê dcrbas bîibîi, kctibû nav daristana ii hember ii  
dimeşiya.

- Ev iawê kûçikan diç ku? Husuk bi hêrs got.
- Ew ê vcgcrc, Mcmed got.
- Derdekî wî hcyc, Aşik Aîi bi bişirîncke bi êş got. însan

bcnderulickî ccêb e. Ger ji min rc bigotana cv zarok yckî  
wiio ye min qet bawcr nedikir. Dibêjin însana şîrê xav  
mêtiye, bi rastî jî wcha ye. Ev însan bendcruhên ecêb in. . .

Memcd:

- Çi bi vî Mcmedê zarok hatiye?

- Tiştekek pê nehatiyc, Aşik Alî bi derd got. Tiştekek pê nehatiyc,  
lê bi min wilo tê ku wê tiştck pê bibe. Halê wî ne  
tu hal e hevalno.

- Çi pê hatiye?

- Qet kêfa min ji vê rewşa wî re nayê Husuk. Piştî wî  
95

gundê bi dar. . .

- Min tiştekek jê fêhm nekir, Husuk got.

-Tu ê paşê fêhm bikî, Aşik AJî got.

Peyva wan bi carekê ve hate birîn. Wan awirên xwe berdan  
ser refê hehecîkên ku hema wextî li serên wan biketana.

Evqas hehecîk bi carekê ve qet nehatibî dîtîn. Hehecîkên  
ku baskên xwe li hev dixistin îî difiriyan, piranî jî

li ser bîstên kom dibîin îî dikir mîna roja qiyametê. Aşik

Alî şaş îî ecêbmayî dima ku çawan bi hezaran hehecîk di

bin guhên hev re difirin ii qet li hev nekevin. Gelo ew çawan  
wdo bi hezaran bi hev re difiriyan îî li hev nediketin?

- Ev jî hikhmeteke Xwedê ye, wî xwe bi xwe got.

Wan berê xwe zîvirandibiin ii li Memedê zarok ku bcr  
bi wan ve dihat mêze dikirin.

- Divê em dara hinarê bibînin, an na ez ji vî lawikî ditirsim,  
rewşa wî xerab e.

Ew heta êvarî wisan li nava bîstên gciryan. Agirê binê

beroşa Ehmed geh gur dibîi ii derdiket derveyî kuçik, geh jî ber bi binê beroşê ve dihat kişandin.

- Divê em sibehê zîi têkevin rê, Aşik Alî rawestiya, li rîiyên hevalên xwe nihêrî îi got. Ev camêr qet naxwaze em herin. . . Ger em vê havînê tiştêkî nekin îi tenê li ba wî bimînin wê rebeno ji kêfan dîn bibe.

- Camêr ji me hez kiriye, Memed got.

Aşik Alî kenîya:

- Em ê çawan ji destê vî zîlamê qenc bifilitin, em ê jê re çi bibêjin?

- Divê em herin, Husuk got. Karê me heye, divê em dara hinarê bibînin.

- Divê em herin dara hinarê bibînin, Memed got.

96

Husuk:

- Divê dara hinarê li van deran be.

Memcd:

- Jinika çiyayî ev der tarîf kiribîi, divê li van deran be.

Li jêr Anavarza, Keleha Dumiduyê, Keleha Maran, li jor Kelcha Hcmîtc li wê beriya bê ser îi bin mîna giravên ecêb dixuyan.

Piştî kurtcdemekê Memcdê zarok hat ba wan. Osiv hîç tevî peyva wan nedibîi, rîiyê xwe yê bi rih ku bi qasî mistekê mabîi dixurand îi difikirî. Bi her awayî ji rewşa wî dixuya ku ew di hundurê xeyalcke kîir de bîi, xayiz bîibîi ii kî zanc bê cw di xeyaian dc li ku bCi. Yê din ber bi holikê vc mcşiyân, Osiv bi wî awayî riha xwc dixurand ii di nava wî crdî dc ma. Siya wî dirçj bîibîi. Dara hinarê mezin bîi,

mîna çinarekc liczarsalî bil, mîna gwîza ziyarctê ya ii Dikcnliyê mczin bii. Şaxên wc scr girik hcmîi girtibiin. Çavkaniya ku ji binê wê difûriyan dida binê dareke hinarê. Binê darê, yanî scrê girik hênik bû. Gava der ii dor ji germê dipcritîn, bayckî hênik ji binê dara hinarê dihat. Dorberî darê bi kuiîlkên têvel xemilî bî. Tam di bin darê dc jî kcvirekî mcrmcrcr î mczin dirêjkirî bii. Li hêlckc kcvirê mermer nivîscn ccêb, li hêleke din jî rcsimê serê jinekc bi lêvên qalind, çavên mczin ii porê dirêj hcbû. Gulên dara hinarê ku bi rohiat re vcbûbiin, di avê dc mabîin. Av sor mîna alaviyê diherikî îi hcmîi dcjt, gîha zer, hîroyên pembe, pirêzên ku dibiriqîn, zinarên şîrkî, çcmê Ccyhanê, bixuşkên hûr yên li rex çem, kokên qamîşan, crdên birincê yên ku ji birincê perçivî ne, ji ava ku diherikî sor î kur biibiin. Ew sorahiya ku ji dara hinarê ber bi deştê ve diherikî, paşê diciviya ser hev ii li jora çiyayên Torosê vedimirî ii 97

winda dibîi. Ev dara bi heybct îi pîroz ji Mekeyî Mukerem haribîi anîn. Gava Hezretî Elî hatibii Çiikirovayê îi şîirê xwe li ba kiribîi, îi zirecêba Anavarza îi çiyayên wê kiribîi du felqc, îi gava di ser stîiyê xwe re nihêrî bîi wî dara hinarê li ber xwe dîtibîi. Dara hinarê a pîroz şax îi pel ii gid ii rehên xwe dabiin hev îi bi dii Hezretî Elî ketibû. Hezretî Elî di jiyana xwe de ne gidên wisa birqokî îi sor, ne jî dareke weha kesk dîtibii. Hezretî Elî çîi ba darê, pişrî ku wî pelên darê yek bi yek mist da, got, hey dara pîroz, tu bide rê îi hcre xwe di wî girikî de biçikîne, Xwedê li wir cih daye te. Li wir bcr bide, pir bibe. Li wir ji nexweşan re

bibe derman, ji bêhêviyan re bibe hêvî. . . O dara hinarê çii xwe di wî girikî dc çikand ii rehên xwe berda binê erdê. Hema ku wê reliên xwe bera binê erdê da, ji binê erdê aveke sor pijiqî. Yên ku ji wê avê vexwarin hew bi tu nexweşiyên ketin. Kelmêş jî nikarin werin binê wê dara hinarê. Ne ew dikarin werin binê wê, ne jî nêzîkî wê bibin... Digcl ku ser riîyê erdê îî esman ji kclmêşan dikelin jî, lê kelmêşek jî nikare nêzîkî darê bibe, ne tenê nêzîkî darê, ew nikarin nêzîkî girik jî bibin. Mar ii dîpişk ii gêrik nikarin nêzîkî girik bibin. Xwînêj, mêrkuj, zalim ii diz nikarin nêzîkî girik bibin. Yê ku sê rojan di bin dara hinarê dc razê, ew spîsaxlem dibe.

Li rexên avê pînga bi pelên şîrkî, li ser zixuran... Ava ku ji zixuran dikele şewq dide, dibe xelck ii diçe ii tê. Bi şevan xezal bêî ku kes wan bibîne tên binê dara hinarê. Ew li dor dara hinarê dibin xelek ii heta ku wenda bibin ew li dora darê zîz dibin.

Osiv ber bi keriyê xezalan ve meşiya îî ket binê holikê. Bêhna rîinê heliyayî yê savarê û tirşika ku li ser êgir dikeli-

98

ya kcte pozê wî. Ruyê Osiv di hundurê xeyalekê de mabii û rengckî nikcnîi stendibû.

- Çi bûye Osiv? Husuk pirsî. Şewq ji rîiyê te difure, çî bîiye?

- Bêhna savarê kctiye difna wî, Aşik Alî got. Ma wekî din wê çî bibe.

Osiv:

- Em hcrin, em herin, em herin da em wê dara hinarê



bibînin.

- Em ê herin Aşik Aiî got. Lê ma ka ew li ku ye, cihê wê ji mc re bibêje da em herin.

- Ciiiê wê kckê Ehmcd dizane, Memcd got. Ew ê ji me re bibêjc.

- Ez cihê wê nizanim, Ehmcd got. Lê wê sibe apê Hesên were vir. Apê Hcscn yckî jîr c, li Çiikirovayê çiqas dar, gul ii gîha hcyê ew bi hcmiiyî dizanc. Çiqas avên pîroz, çiqas şikeftên pîroz hebc, çiqas çiiik îî kêzikên bi jifa hebe ew cihê gişan dizanc.

- Xuyayc cw Hckîmê Loqmanê vê demê ye, Aşik Alî got.

- Ev pêncî sai in ew gîhayên derman didc hcv, tam pêncî sal in. . . Ew van çiyân, vê zirecêha Torosa li jor, vî çiyayê Nîir yê li jêr, ew kevir bi kevir, zinar bi zinar nas dike. Ew ji Hekîmê Loqman jî jîrtir e. Ew ji kesî re nabêje, lê ew jî mîna Hekîmê Loqman li dermanê mirinê digere. Ew ji panzdeh rojan carekê, ji mehckê carekê riya xwe bi min dixê. Di nava werz de kulîlkeke dirêj ii sor şîn tê îî ber bi esmanan pêl dide. Apê Hesên tê wê kidîlkê jê dike. Ew carinan jî wê kulîlkê nabîne, ha tu wê çaxê li rîiyê apê Hesên binêre. Rîiyê wî dibe mîna quzelqurtê.

99

- Dibe, Aşik Alî got. Mêşa hingiv bi qîmeta gulên dizane. Ma her mêş ji ku bi qîmeta kidîlk ii gulên dizane!

- Ha binerîn bê ew gula ha çawan dirêj biiye. Gava apê Hesên vê bibîne ew ê ji kêfan dêhn bibe. Gava ew vê kulîlkê bi vî awayî bibîne, ew ê bi kalîtiya xwe li dora wê govendê

bigire ii ji kêfan bifire. Ger ew sibe neyê ew ê dusibe were. Ew bi dema vebiina gulê, saet bi saet dizane.

- Hela hela! Aşik Alî got. Tenê alim bi tiştên weha dizanin.

- Ger dareke weha hebe, wê apê Hesên bi cihê wê bizanibe.

Ger li vê deştê dareke weha hebe, li vê Torosa li jor, li vî çiyayê Nûrê yê li jêr, li vê Gawirdaxa li jor, li wê behra di bin wî cwrê spî de, li kîjan newalê, li kîjan bihurê, li kîjan kendalî, li rex kîjan çemî hebe ew ê apê Hesên bi cihê wê bizanibc.

- Ew ê bizanibc, Aşik Aiî gor. Karê me dikeve rê.

- Hîin dikarin li vir li benda wî rawestin.

-Ax xwezi li van deran karek jî hebîiya. . .

- Teew, ku hebîiya, Ehmed gor. Nîne. Ma wê li nav vî bîstanî çî kar hebe? Hevdana petêx ii şebeşan heye, ew jî danekî têra şeş kesan nake. Yê min jî perê ku ez heqê roja we bidim we nîne, ez bi xwe jî. . .

Dawîya wê negot.

- Kerem bikin werin btxwin, got.

Xwarin ji ya firavînê jî )cweştir çêbîbti. Çiyayî dîsan kişyan ser xwarinê.

Piştî xwarinê Ehmed çtl petêx ii şebeşên ku ji bo cemidandinê xistibîi bîrê derxistin û anîn îi şikandin. Şebeş wek )cwînê sor bîi, çirke çirk jê dikat, petêx zer, eyn mîna rojê bii.

IOO

Gava bû cvar Ehmcd got:

- Hiin ê li vir nikaribin ji ber mêşan razên, got.

- Ma em çî bikin? Aşik Alî jê pirsî.

- Em ê êgir dadin, Husuk got. Em hertim wisa dikin, em êgir dadidin îî li bcr dbcana wê radizên.

- Ne mimkun e ku em bikaribin bi êgir zora wan bibin.

- Stareya min mezin e, Ehmed bi kêfgot. Li vir, di hundurê stareyê de... Htin çend rojan li bendî apê Hcscn dimînin bimînin. Binerin va ye gula wî ya sor mezin biiye. Ew bi çî awayî ji mezinbîna gulê fêhm dike ez nizanim, lê gava gul mezin dibe ew dide rê ii tê vir. Ew mîna ewliyayekî yc, wê ji hcmti dcrdên wc re dermên bibîne.

- Baş c, Memcdê zarok got.

Bii êvar îî ro çîî ava. Kclmêşan mîna cwrekî reş bi ser wan vc girt.

- Starc, Ehmcd got.

- Ew dev li mirov dikin îî derbas dibin, Aşik Alî got.

- Ev pêşî bi hcstî ne, yaho! Memed bi ken got.

- Ev pilingên Torosê ne, kclmêşên Çîikirovayê ne, Aşik Alî got.

- Hê xcrabrir in, Husuk bi scr vc zêde kir.

Ehmed starc ji ser holikê daxist îî anî ii ketin binê holikê. Bi rastî jî ciblikcke (stareyckc) mezin bîî, hemii ketin binê wê. Kelmêşan bi vize viz dora ciblikê pêçan.

- A niha ger li derve hespek, çêlekek, kerek, gurek, pilingek hebc wê ev kelmêşên han wan bixwin, wê çermên wan di )cwînê de bihêlin.

Hema ku wan serên xwe danîn ser behlîfên ji gîhayê digel wê germê jî ew taviê di xew re çîin.

LOI

Li vir, jiyana wan di nava vî bîstanî dc wilo dcwam dikc îî

ew li benda Hesenê gîhavan in. Herçî Ehmedê li ber bîstên e, ew ji ber mêvanên xwe dilşa ye. Ji ber ku wê mêvanên wî bi hatina Hesenê gîhavan re biçîna, wî nçwêrbî li aliyê Anavarzayê li riya Hesen binihêriya.

Osiv di hundurê van hersê rojan de, her sibeha Xwedê bi tayê diket. Osiv hem dişewitî îî hem jî diranên wî ji serman bi şingînî li hev diketin. Maziibanê wan Ehmcd di hundurê van hersê rojan de mazîibaniyeke bêqusîir ji wan re kir ii bêhawe li ber Osiv ket. Ger du canê wî hcbûna, bêî ku ew bifikire wî ê canekî xwe bida Osiv. Ax, ger karek li van deran hcbtiya, karek li nav vî werzî hebîiya ku ev çiyayiyên baş ji xwe re hera payizê bixebitiyana îî çcnd quruş perc têxistina bêrîkên xwe îî desrvala bi ser maliyên xwe de venggeriyana. . . Di hundurê van hersê rojan de wan hcrtiştê xwe ji Ehmed gotin. Ehmcd hînî hemii tiştên wan bti. Gayê zcr ku hate qurbankirin, bizina ku hate firotin, xwişka ku li riiyê wan nenihêrî, hunerên dtirî aqilan yê dara hinarê. . . Paşê her êvar, Aşik Alî tembîira xwc dixist hemêza xwe, xwe bi ser de xwar fikir li bi dcngê xwc yê bi şewat digot. Dil ii hinav li mirov pcrçe fikir. Stranên nedîtî li ser Çîikîrovayê, li ser zalimtiya însanan, li ser kelmêşên xwînmij, li ser germa ku hesriyê mirovan jî dişewitand, digot. O çavên wî jî hertim li riya Hcsenê gîhavan bû.

Bi derketina rojê re, bi gewrbtina serê Gawirdaxê re ii bironaliîbîina çiyayên Duldidê ve hew dîtin ku Hesenê gîhavan telîzek li piştê ye îî bi dengê "Ehmed, Ehmed, kurê min Ehmed" îî di ber wan de derket. Rîi ii riiçikên Ehloz

med bîj mîna xwciiyê.

- Va ye hat, bi dcngckî mirî got. Ew hat, Hesenê gîhavan... Hcmîi kêfxwçş bûn î li mêrik zîvirîn. Hesenê gîhavan zilaiTiekî zirav ii dirêj bû. Hcbekî bcr bi pêş ve tewiyabîi î bi gavên mezin ber bi wan ve dimeşiya. Ew tavilê gihîşt ba wan. Riha wî ya firk ku rûyê wî yê zirav nixumandibCi dakctibii hcta scr zikê wî. Riha wî spî, bêl lckc î dibiriqî. Stîi î rûyê wî di nava qermîçokan de mabû, bûbîi mîna tevna pîrê. Çavên wî yên kesk ku kort çîbîin mîna du diiopên ronaliyê dixuyan. Ew hema dikeniya, bi pîrqînî dikcniya. Yê ku cw bidîra, wc bigota vî zilamî ii vê dinyayê qet derd û kul, xem û kedcr ncdîtiyc.

- Gulcn min mczin bûnc, mîna bizotan sor biine, ez tam di wcxtê de hatime. Ez dcma wan dizanim. Ez dizanim bê li vc dinyayê, li nav kîjan erdî, çi gul, kcnî şîn tê. Kalikê min jî, kalikê kalikê min jî, kaiikê wî jî dizanîbû. Xwedê sulaia min ji bo bcrdcwamiya Hekîmê Lokqman afirandiye. Hemii gid, gîha, dar ji bo tişteki çêbîinc... Her kcs î li vê dinyayê karckî wan heye, yê me jî karê mc cv c. Ew ji suiala Hckîmê Loqman dihat, Hcsenê gîhavan bi vê pesnê xwc dida, wî nc dizî kiriyc, nc kcs xapandiyc, nc kes pelçiqandiyc, wî nc zilm kiriyc, nc erza kesî şikandiye, koka wî ji zcmanan û bi vir de li vê Torosa bê scr î bin gîhayê didin hcv û wck dcrman li nexweşan belav dike. Hesenê gîhavan li ku însanckî bibîne jê re qala xwe dike, hundurê xwe jê re vedike, ew qîmetê dide însanan. Ew pir qîmetê dide karê xwe jî.

Gava wî ev pênc peya li hemberî xwe dît, ew dilşa bij, wî

dest pê kir ii ji wan re behsa serpêhariya gîhayê ya pêncîsalane kir. Wî bê ku bêhna xwe berde behs dikir.

Ew ji zimanê çîkan, yê gêrik îî kêzikan fêhm dike, ew ji zimanê gîhayê, yê daran îî yê hemii gulan fêhm dike. Ew ji zimanê ava ku diherike, bayê ku tê, ewrê ku difire fêhm dike.

Wî ew gula sorîkur hil kir ii hat. Ji kêfa dikira bifiriya.

- Ev gul heye ya, ev gid. . . digot. Ev gula sor heye ya, ew di tarîtiya şevê de mîna perçak roj dibiriqe. Mirov rîrêjên wê têê ji diir ve dibîne. Xwedê zane bê wê ev gula ha çcnd mirovan ji êş îî nexweşiyên xelas bike. Ev gula ha. . .

Aşîk Alî xwe bi hêdîka nêzîkî mêrikê dilşa dikir. Gava tam xwe gihand ba wî, got:

- Hesen axa, ev çcnd roj in em li vir li benda te nc, şikir ji Xwedê re va ye tu hatî.

Çavên Hesen yê di korrikên xwe dc vebîin:

- Belê ez hatim, ma gelo hewcedariya we bi gîhayekê, bi gidekê, bi dermanekî hebî?

- Belê, heye, Aşîk Alî ji dil got.

- Bêje wê çaxê, Hesenê gîhavan bi ken got.

Piştî ku Aşîk Alî çcnd caran xweziya xwe daqurtand, got:

- Li van deran darcke hinarê hebîye, li ser girikekî bîye.

Aşîk Alî di vir de sekinî, Hesenê gîhavan çavên xwe yê mîna polayê ber bi wî vekirine, birîyên xwe qermeçandine îî li benda dawiya gotina wî ye.

Aşîk Alî zii bii zû, mîna ku wê gorinên wî ji devê wî baz

bidin gorina xwe berdewam kir:

- Xwedê giravî ew dara ha bi kêrî yên ku bi tayê ketine

104

tê. Em c Osiv bibin bcr wê darê. Ev Osiv heye ya... (Bi destan Osiv nîşan da) Ji ber tayê ruh tê de nemaye. Ger em wê dara hinarê nebînîn wê Osiv bimire.

- Wê bimire, Memed jî gor. Heyf e, Osiv zilamekî pir baş e, bila ncmire. Ax, ger me cv dara hinarê bidîta...

Hesenê gîhavan:

- Hûn çî dibêjin ji bo Xwedê wilo? pirsî.

- Bi tenê tu ê cihê wê darê bizanibî. Ji te pê ve li vê Çîktirovayê, li van Torosan kes wê cihê dara hinarê nizanibe.

Wan hêla mêrik ya qels qefaltibîn ii bi wê riyê didan ser wî.

- Dibêjin ku tu bi rcha hcr gîhayê, zimanê hcr gîhayê, xûyê hcr gêrikê dizanî.

- Hîin çî dibêjin ji bo Xwcdê?

- Tu zanî Hcscn axa, rcwşa me xcrab e. Ger em wê darê ncbînîn, cm ê av û av herin. Xwedê zane, tu cihê vê darê dizanî, Hcscn axa. Ji kcrcma xwe re cihê wê darê ji me re bibêje...

- Ji bilî wê dara hinarê a pîroz ru hêviyên me nemane.

- Osiv ncxwcş e...

- Em perîşan in...

- Ev du-sê mch in em li vê Çûkîrovayê digerin, em ji însanetiye derkctinc.

- Em ji îsanctiyê dcrkerine, lê me tu kar jî nedîtiye.

- Ger cm wê dara pîroz bibînîn îi em şevêkê li bin wê

razên, em ê ji hemii dcrdan pak bibin.

- Kê ev ji we re got?

- Herkesî. Li Çîikîrovayê herkesî ji me re behsa vê darê kir.

- Wan gorin ku ger hîin wê darê nebînin htin îflah na-  
105

bin...

- Kê got?

- Wê jinika ji çiyayê Duldulê. Ha ji vî gundê bi dar.

- Wê got, bi tenê ew dara hinarê dikare alîkariya we bike.

- Yê ku li vê Çîikîrovayê li bin wê darê ranezên îflah nabin.

Hesenê gîhavan wilo ji xwe re bédeng, bi bêhnfirehî ii bi riikenî li wan guhdarî fikir, paşê bi dengê bi xwe bawer:

- Li Çîikîrovayê dareke wilo pîroz tune, got. O bi .ser ve zêde kir, ax, xwezî ku hebîiya. . .

- Heye, Aşik Alî bi dengê bi bawerî got. Heye!

Memed:

- Heye!

Osiv:

- Heye!

Husuk:

- Ma qet dibe ku tuncbe? Tu cihê wê nizanî îi tu ji dara me re dibêjî tuneyc!

- Tuncye, Hcsenê gîhavan bi înad got. Ger hebîiya min ê cihê wê bizanîba.

- Tu cihê wê nizanî, Aşik Alî got.

- Tu cihê wê nizanî, Husidc jî bi dengê gur got.



- Ez cihê wê dizanim, Hesenê gîhavan got. Li telê wî ketibû.

- Ger tu cihê wê dizanî wê çaxê ji me re bibêje, Aşik Alî got.

- Tuneye, ku ez bizanibim.

- Heye.

Ehmedê bîstanvan xwe avêt ortê, ew bîskê nerm kirin.

io6

cw li bin siya bîhê da rûniştandin ti şbeşê cemidî ku ji bîrê derxistibûn, şikand ii li ser gîhayê belav kir.

Roj bilind dibî.

- Kcrem bikin.

Wan dcst bi xwarina şbcş kirin.

Piştî ku hcbckî bêhna Hcscnê gîhavan hat bcr wî:

- Hcbîi, got, ii vê Çûkûrovayê gelck darên pîroz hcbîin.

Ji vir îi hcta behrê tije darên hinaran bûn. Di mehên havîn

îi biharan de van daran gulên wilo sor vedidan ku ew

mîna pêlên bchrê li ba dibûn. Di bin gulên hinaran de

marên reş baz didan scr liev, ew sor î kur dibiin... Li vê

dcştê tu dar neman. Wan hcmû dar ji kokê dc birîn. Niha

li Çîdcûrovayê nc darên hinaran, nc yên bcrtiyan manc, ne

çam mane, nc dirîreşk manc. Li vê dcştê tiştckî pîroz nemaye

ku dara hinarê bimînc. Ji xwe hinareke wilo pîroz

tunebii. Çi tiştcn baş û mcrvan licbûn hcmûyan dan rê ti

ji Çîikûrovayc bar kirin. Gcr darckc wilo pîroz li vê beriya

Çûkûrovayc hcbûya wc niha zii dc şax û pclên xwc bidana

hcv û hida rc û ji Çûkûrovayc bar bikira. Darekc wiio tuneyc.

Gcr hcbc jî cw şifayê nadc, ji dcrdc wê re tu dcrmanî

nabîne.

- Darcke wiio hcyc, dîsan Aşik Alî got.
- Wê ji derdê me re bibe dcrman, Mcmed got.
- Tu çareya wê nîne, Osiv got.
- Ger cw tunebe, dareke wilo nchatibe dinyayê, wê çaxê warê me kor bii, Husuk got.
- Rabin scr xwc, Aşik Alî got ii f)ncgizî ser xwe. Divê em wê dara hinarê bibînin.
- Çawa darcke wilo tune. . .
- Li ser girikê spî. . .

107

- Li ser girik...
- Sorahiya wê li hemii deştê belav dibe. . .
- Bi qonaxa rojekê mîna agirekî sor dike. . .
- Wê çima ew jinika ji çiyayê Diddidê derewa li me bike?
- Wê ji ber dcreweke wilo çi têkeve kîsê wê?
- Em ê wê darê bibînin.
- Em ê wê darê bibînin ii bigihîjin miradê xwe.

Ew pir hêrs bûbîn. Digel vê jî wan ji Ehmedê bîstanvan re gotin:

- Di )cweşî îi silamtiyê de bimîne, mirovê qenc.
- Qenciya ku tc bi me kir bavê me jî bi me nedikir.
- Ji xwc dinya ji ber qenciya mirovên weha li ser lingan maye.
- De bi xatirê te. . . gotin.

Ew bi lez ketin rê îi di nava gîha îi diriyên de mcşiyên.

Ew ber bi pozê Anavarzayê yê rohilat ve meşiyên. Hcta ku ew ji ber çavan wenda biin, Ehmed xwe dabîi zer pozikên solên xwe îi li wan dinihêrî, paşê cw zîvirî ba Hesênê gîhavan

ii riinişt:

- Ew çtin, got. Aax karek tuneye, xwezî li ba min karek hebtiya ii min bida wan.

Hesenê gîhavan:

- Cih pir li wan teng bîiye, ew dara. . .

Ehmedê bîstanvan bi tclaş peyva wî birî:

- Ew ê bibînin, ew ê wê dara hinarê bibînin. Ma ew ê çawawilo destvalavegerin malê?

Hesenê gîhavan bi telaşa Ehmed hebekî nerm bîi:

- Kî zane, got. Belkî jî ew bibînin. Însan e, pir kerametên însên hene.

io8

- Pir kcramctcn însên hcnc, Ehmcd jî got.

Ew bi rohilat rc gihîştin bcr çcmê Savrunê. Ava çemê Savrunê wilo kê m bîbû ku cw biibî mîna cihoka kaniyekê.

Wan xwe di ser çem rc hol kirin aliyê din. Ji jor ve gundekî bi xaniyên kelpîçî xuya kir.

- Em hcrin gund, Husuk got.

- Nabe, Aşik Aiî got. Hcta ku em dara hinarê nebînin em narin tu gundî.

- Ger em ncçin gundan cm ê ji ku cihê dara hinarê bibînin? Husuk bi bcrgrîn got.

- Em ê bibînin, Mcmcd got.

Ew kctin rê. Ew hcta bi bazinên lingên xwe di toza rê de diman. Hê tava rojê baş gcrm ncbûbû, ew toza ku diket çaroxên wan lingên wan ycn hênik mist dida.

Hew dîtin ku ji hcmbcr traktorckc tîrincî hêdî hêdî ber bi wan vc tê.

Gava traktor nêzîk wan hîi, wan xwe ji ser rê dan alî ii rawcstiyân. Rcngec tara li scrê şofêrê traktorê jî tiirincî bîi.

Gava traktor tam hatc bcr wan, şofcr sekinand:

- Selamucickum palcno, got. Xuyaye we karê xwe xelas kiriye û hîin vedigcrin?

- Belê, em vcdigcrin, Husuk got.

Yê şofêr bi çavên xwe yên reş û mezin ku dibiriqîn, bi xemgînî gor:

- Heyf e, îsal li Çiikîirovayê tu kar tunebîi. Ji niha ii pê ve jî wê bi zchmetî peyda bibc.

- Rast e, Husuk got.

Gava yê şofêr xwe hazir kir ku traktorê bajo:

- Ka rweste, Aşik Alî got.

109

Şofêr li wî nihêrî:

- Ma tu hozan î? jê pirsî. Kerem bike hozan, ma gotineke te heye?

- Belê heye, Aşik Alî got. Em li dara hinarê ya li ser girikê spî digerin, ma tu cihê wê dizanî?

Rîiyê şofêrê ciwan yê esmer hat guhertin, çavên xwe hiirik kirin îi demekê fikirî.

- Min ne girickî welê dîtiye, ne jî ez bi cihê darekc wclê dizanim. Li qusîira min menêrin.

Lêwik traktora xwe ajot ii çîi.

Husidc ji nişkê ve wck dînan hêrs bii:

- Ma mirov cihê dareke wilo ji zarokekî wilo dipirse? bi hêrs got.

- Darckc wilo. . . îi zarokekî wilo! Memed jî got.

Osiv jî hêrs bîi:

- Ma wê ev zarok ji ku bi cihê darê bizanibe? Mirov ji zarokên wilo dipirse?

Mcmcdê zarok nedipcyivî, ew xayiz bîibîi îi di xeyalan de kîir çuibîi. Tiştck ji riyyê wî nedihat fêhmkirin. Rîiyê wî hemii maneyên xwe winda kiribîi.

Aşik Alî jî hat ser ya wan:

- Min nizanîbîi, got. We dît bê rîiyê lêwik çiqasî baş îi midaliîm bîi. Gcr wî cihê darê bizanîba wî ê taviîê ji me re bigota.

- Ew nizane, Husuk bi dengekî gur got.

Di rê de siwariyek dcrbas bîi. Li dû wî jî erebeyekc hcspan.

. . Sê kalemêr di hundurê erebê de hebiin. Li dii wan jî otomobîlek di ber wan re derbas bii ii ew ji serî heta binî di tozê de hiştin. Paşê zilamekî li dor çilî, î bi şewqê qeselî, bi kincên lacîwert ii bi solên spî, di ber xwe de tiştin digoiio tin ii bi lez di bcr wan rc buhurî. Çavê yckî ji wan jî di mêrik dc nebuhurî ku cihê dara hinarê jê bipirsin.

Ro bîi nîvro, tava rojê germ bîi îi ew jî ji germa şewitîn.

Ew bêî ku bipcyivin di nav erdan rc derbas biin, hatin ser çemê Savrunê îi li ber siya kendêl riiniştin. Bitxçika xwarinê ya ku Ehmcdê bîstanvan ji wan re dagirtibîi, vckirin îi dcst bi xwarinê kirin. Ava çemê Savrunê biibîi wck ava hemamê îi zcr bîibîi ti hêdîka diherikî. Ji mecbîirî ji wê avê vexwarin. Piştî )cwarinc wan xwe dirêj kirin ti heta ku bayê xerbî hat, ew razan.

Pêşî Aşik Alî rabii îi li scr xwe rîinişt îi bi dii wî re jî yên din rabîin. Wan li rûyên hc v nihêrîn ti bédeng man, nizanîbûn

ku wê çî bikin. Rûyê Aşîk Alî bi carckê ve bişîrî, wî  
ji hembêrê ve zilamekî ku tencê didêra dît.

- Bincrin wa ye yek li wî hemberî tencê didêre.

Yên din jî ew pîçya dîtîni ii kêfxweş bîni. Bê ku ew bipeyivê  
Aşîk Alî li pêş yê din jî li dû wî bîni ii bîrê xwe dan  
mêrikê ku tene didêra.

- Qawctê bî.

- Xwedê ji we razî bî! Kêremê bikin, kêremê bikin. Xwedê  
hîni ji min re şandine. Ma hîni dizanîni tene bidêrin?

- Îfê, em dizanîni, Aşîk Alî got. Ma melêvên we têra  
me dikîni?

- Şêş melêvên me henc, wê heval bihatana, lê do li gund  
xîrecîrê derket û du kêş hatîni kuştîni.

- Derbasbîtiyê bî. . .

Mêrik:

- Navê min Resîl e, got.

Yên din jî xwe bi mêrikê dane naskirin.

- Kêremê bikin, bila herkesê rahêje melêva ku ew jê hez

III

dike.

Memedê zarokê li wê derê wîlê bîdeng ma.

- Ev hê zarokê, ew nîzane tene li ba bike, Husukê got.

Li Memedê zîvirî:

- Memedê zarokê, got, tu hercê li binê siyayê wê erebeyê rîne.

Bê ku lawîkê tiştêkî bibêje, çî berê siyayê erebeyê rîniştî ii piş-  
ta xwe spartê tkerê wê. Hebkî wê de, li qiraxayê çîhokê kîlbeş  
bi navekê bilind bîbîni ii li berê bayê xerîbê hêdîka li ba  
dibîni.

Yên din jî dest bi bakirina benderê kirin. Hê bcrî ku bibe êvar wan hemîi bëndcr xelas kirin. Pcrê ku heq kiribiin Resîd cihê cihê xist mista wan:

- Gelckî spas birano, we ez xclas kirim, got. Min bi scrê xwe nikarîbû ev bëndcra ha di sê rojan de bidêra ii wê li vê derê kelmêşan ez bixwarima. Heta ku hîin şîvê nexwin ez we bernadim.

- Em bi lez in, Aşik Alî bi qurnazî got. Divê em wir bibînin, divê em bigihîjin wir.

-Ku?

- Dara hinarê ya li girik. Ma ru bi cihê wê darê dizanî? Li vê Çîikîrovayê herkes bi cihê wê darê dizane. . . wan cihê wê ji me re gotin. . .

- Cihckî li van deran ji me re tarîf kirin...

Hela ka htin rîinin nanê xwe bixwin, ew hêsan e. Rast e, wê li van deran li cihekî dareke hinarê hebe. Hela hîin riinin. Jinikê bi têra dch kesan xwarin şandiye. Hela ka hîin riinin bi bêhna fireh xwarina xwe bi)cwin, wê niha Mele Hecî gula wî di ber guhê wî de îi were. Ew her roj, li ku dibe bila bibe ew gulekê dibîne îi dixe ber guhê xwe. Ew ê III

piştî kciyckê di vir rc bibuhurc, ew ê ji nav baxçcyê pirtîiqalan dcrkcve wcre. Baxçcyê pirtîiqalan jî bi tenê huvdeh dar tê dc hcne. Hcr zivistan baxçê wî di bin avê de dimîne îi cw jî hcr bihar ji nîi vc huvdch darên nû diçînc. Xwcdê zanc ew bi cihê wê dara hinarê dizane.

Şewqcke qurnazane di çavên wî de f)êket.

- Hela hûn xwarina xwc bixwin, belkî ez jî cihê wê darê

derxim, li van dcran darckc wilo hcyê.

Resîil sifrc raxist, beroş danî orta sifrê. Du mirîşkên heşandî di bcroşê dc bûn. Di firaxeke mezin de jî birinceke têrtin hcbû. Palc kişyan ser )cwarinê. Wan bi lezeke wilo xwarin ku taviîê xwarin xcias kirin.

- Ji kcrcma xwc rc ji mc rc cihê wê darê bibêje, bira, digotin. Ew dara ha ji mc rc pir lazim c. Gcr em cihê wê darê ncbînin nabe...

- Ev du mch in ku cm ii Çtikîrovayê ne. Ne me karek bi dcst xist ne jî tiştck... Wê Osiv jî bimire. Em ê hemî ji nexweşiyê himirin.

- Ka bisckinin, ka bisekinin, mêrik gor îi fikirî. Ka bisckinin cz carckê bifikirim ii bînim bîra xwc, wê cihê wê darê niha wcrc bîra min.

Wî scrê xwe dizîvirand îi ii jcrî rê dinihêrî:

- Ev Mclê Hecî jî nchat.

- Zû bifikirc, birawo, Aşik Aiî bi hergrîn jê re got. Zii bifikire ku bcrî tarî dakcve em xwc bigihînin ba wê dara pîroz.

- A niha, a niha...

Resîil li Zinarên Anavarzayê, li çemê Savriinê, li çiyayê Diddulê dinihêrî, ew ji cihckî ii bendî hawarekê bîi.

Tam di wê navê de serê Hccî xuya kir. Resîil bi kêf ber "3

bi wî ve baz da:

- Em li bende tc bûn Seyda, got. Çavên me li riya te qerimîn.

Binêrc cm ji mêj ve li benda te ne.

Ew bêî navbir dipeyvî:



- Jineke ji van gundên jêr ji van camêran re qala dara hinarê kiriye. Wê ji van camêran re gotiye ku hûn şevê li bin wê dara pîroz razên wê Xwedê we ji hemî derd î belan pak bike. Ev hevalên me jî, binêre wan di bêhnekê de bender ba kirin, ew li wê dara hinarê digerin. Jinikê ev dcr ji wan re tarîf kiriye, baj e ku wê kiriye. Ma min ii te me ê ji ku bikarîba ev zirbêndera ha ba bikira? Min jî ji wan re gotiye ku li van deran girikek hayc, lê dar lê heye an jî tune, ez nizamim, min got zanibe zanibe wê Mele zanibe.

Hecî:

- Ez cihê wê zanim, got. Pir qenciya wê darê gihîştîye min î gundiyan. Lê cw paşê hişk bti.

Paşê wî bi desta girikek nîşan da:

- Binerin, dara hinarê li ser wî girikê han î gewr bîi. Ew mîna çinarckê mezin bîi. Gava mehên bihar ii havînan gul dida, ji dîir vc mîna komek bizot dixuya. Yê ku li bin wê, li ba wê, li ser erda wê şevê razana, çî bixwestina Xwedê dida wan. Binerin ha li wir e, ne zêde diir e. Ger we bivê hîin dikarin îro li ba me bimînin. . .

- Hîin dikarin heta sibe nîvro yê alîkariya me bikin, Resîl got. Ez ê hê gclck pere bidim we. Hûn dikarin sibe nîvro ji vir bidin rê ti hîin ê li dor êvî bigihîjin ba dara hinarê. Binerin, wextî ro here ava. Heta ku hîin bigihîjin wir wê tarî dakeve erdê, wê çaxê ne dara hinarê, hîin nikarin girik jî bibînin.

Xebera Resîd bîi. Ew wê şevê li wir man. Lê kelmêşan

"4

nehiştin çavên wan herin scr hev. Kelmêşên wê şevê ne

guh didan êgir, nc jî guh didan dixanê. . . Sibehê zîi dest bi kar kirin îî heta bi nîvro xebitîn:

- Em ê herin ba dara hinarê, gotin, perên xwe ji Resid standin.

Mcle Hecî bi dcsta cihê dara hinarê nîşan dida îî ji wan re behs dikir. Ew jî ji kêfan di qalikê xwe de hilnediharin.

Ew berî bi csir gihîştin ber girik îî hilkişiyar serê girik.

Wan li ser girik tdu darên şîn nedîrin. Lê tam li orta girik wan qurmê dareke qalind ku rehê wê li ser girik hemtiyî belav bîibii, dîrin.

- Mc dît, Aşik Alî bi kêf bang kir. Pir şikir ji Xwedê re va yc mc dît. A cv e. Ev rch, rehên wê dara hinarê ne.

- Rchên wê nc, Husuk jî gor.

- Gcr dar bi xwe nemabe jî, koka wê maye, Memed got.

Ha koka wê, ha gcwdê wê, ha gidên wê yên sor, ha şaxên wê, lia pelên wê...

- Hemû yek e, Osiv got.

- Em dia bikin, Aşik Alî got îî destên xwe ber bi Xwedê vc vckir. Wan berê xwc bi qible vekirin îî hêdî bi pistînî dia xwendin. Bi tcnê Memedê zarok tevî dia wan nebî.

- Ma tu nizanî dia bikî, Memedê zarok? Aşik Alî jê pirsî.

- Ez dizanim, Mcmedê zarok got.

-Êê?

- Dar bi xwe miriyc. Xêra wê negihîştiye wê ku bigihîje me...

- Hişşş, Husuk got ti ber bi wî çîi. Hişşş tu ê belakê bînî serê me. Hişşş zarokê pîs, ma mirov tu carî li hemberî dareke pîroz wilo dipeyive?

"5

Yên din jî mîna Husuk gotin. Belkî heta nîvê şevê wan ji lêwik re behsa darê îi behsa kerametên darê kirin. Lê lêwik gidi nedida wan, peyvên wan dixist gidiekî îi di yê din re derdbcist.

Bayê xerbî ku ji êvar de dest pê kiribii, êdî biibî mîna bahozeke. Ji ber bayê xurt kelmêşan nikarîbtin xwe li ser girik r^irtina. Ew wê şcvê hcta sibehê bi rehetî raketin.

Pêşî Aşik Ajî şiyar bii. Tembiira wî li ber serê wî bti.

Destê xwe da tembtirê. Hertim gava ew şiyar dibe divê ew pêşî destê xwe bide tembîira xwe. Ev yek riya xêrê li ber wî vedike. Piştî Aşik Alî Memed, piştî Memed Osiv îi piştî Osiv jî Husuk şiyar bîi. Ew daketin jêrî girik, piştî xwe bi girik vekirin, kerin rêzê îi mîz kirin. Gava wan mîza xwe kirin ferq kirin ku Memedê zarok ne di nava wan de ye. Li çavên hev nihêrîn.

- Belkî ew li van deran be, Memed got. Em lê bigerin em ê wî bibînin. Dibe ku jî ew niha vegere ti were.

- Ew venagere, Aşik Alî bêhnek bcrda îi got. Çi lawikekî qenc bii. Derd îi kida wî corek gayên bi qulonç bti.

- Xencera min? Xencera min... Husuk got ii hem xwe dipeland hem jî bi girik ve radipelikî.

- Xencera min, xencera min nexuyaye! Lêwik êvarî xencera min biriye ii çîiye.

Jê pê ve tu deng ji Husuk jî derneket. Ew demekê wilo bêdeng li ser girik riiniştin. Paşê mîna ku Aşik Alî ji xewê şiyar bîibe:

- Xuya bû ku wî ê tişteki welê bikira, got. Xwedê bike

xerabiyek neyê serê wî. Tiştê bii bii.

Yên din nepeyvîn.

Ew ji ser girik daketin jêr, Aşik Alî da pêşiya wan ii wan

ii6

bcrê xwe dan çiyayên mor ku di nava dixanê dc mabîin îî  
ya Xwedê îî ber bi Bînbogalar ve meşyan. Ji milê çepê, pir  
ji dîir ve serê çiyayê Diddulê hêdî hêdî gewr dibîi.

Li dor nîvro wan Dikenlî derbas kiribîin ii ketibîin riya  
Karatepeyê. Bêhna zozanan, bêhna çaman û bêhna pîingê  
dikcte bêvilên wan. Memed ketibîi pêşiya wan îî bi gavên  
xurt dimeşyan. Ew demekê sekinî, bi helkehelk got:

- Wan gayê min ê zer kirine qurban, hey Aşik Alî. Gava  
ez çiihtim ew li dîiv min giryabîi, eynî weke însanan. . .

Aşik Alî nizanîbîi wê çî bigota. Ew dîsan meşyan.

117

Çukurova çavkaniya çîrok û romanên Yaşar Kemal  
e. Hem Çukurovayê Yaşar Kemal kiriye nivîskarekî  
cîhanî, hem jî Yaşar Kemal Çukurova cîhanî kiriye.

Dara Hinarêjî ji çavkaniya Çukurovayê dizê.

Yaşar Kemal di vê romana biçîik de serpêhatî  
û qedera çend çiyayîyan bi êş li elem, bi xemgînî  
û dilşahî, bi reşbînî û hêviyên wan ve, bi zimanekî  
herikbar û destanî radixe ber çavan.

\*\*

## DÊ Û DÊMARÎ

Egîdê Xudo

Weşanên NÛDEM

Roman

Ji tîpên kirîlîkî: Nacî Kutlay

Weşanên NÜDEM

Weşanên NûDEM: 7

Dê û Dêmarî

Çapa Yekem: trêvan 1986

Çapa duwem: Stockholm 1995

@Weşanên NODEM

Pergala berg û rûpelan: NODEM

Wêneya bergê: Matisse

ISBN: 91-88592-057

Navnîşan:

Tennov. 52. 2 tr.

177 75 Jarfalla-5weden

Tel û Fax: 8-58356468

Zivistana sala 1942'an bû. Karê nû ji xebatê vegeyriyabû.

Wê şevê nobedariya wê tunebû. Hatibû ber

kuçikê sikî-sar. Xwe bi xwe jî nizanibû çima destê wê

tişte~ nedigir~. Xêlekê li nav odê sekinî, dor-berê xwe

nihêrî, paşê lempe vexist, çend dar û sergîn kire sobê,

agir berdayê û ber bi satila avê çû. Avê tê de bûz

girtibû. Xêlekê şûnda tîn kete odê. Karê satila avê danî

ser sobê, ji bo ku bihele, lê bi xwe jî li ser yanê pal da.

Nalîna Anahîta biçûk a nexweş ji ber guhê wê nedîçû,

ku ji dest germê ber pesna xeber dida, gazî diya xwe û

bavê xwe dikir, destên xwe yê n spî û biçûk dihejand,

ava sar dixwest ... Giliyên doxtir ketin bîrê: "Guman

kêm e, dibe ku qîzik ranebe ... " Gotina dîrektorê mala

zara -Badalyan- jî bi bîr anî, ku got: " Na xêr, Anahîte

serma negirtiye ... "

Karê ji cî veciniqî û ber bi dêrî çû, xwest here teseliya Anahîte bike, lê paş de vegeriya. Agirê sobê bihurtibû.

Pencerên qişa girtî bûn, nîşana derve gelekî sar e.

Vegeriya, nivînê xwe vekir, kincê xwe ji xwe kir û kete nava cî. Lê wexteke dirêj xew nekete çavan. Vê carê salên jiyana wê hatin bîrê ...

Hela dergistî bû, her tişt teribî ...

- Karê, -rojek berî çûyina wî ya eskeriyê, Cemalê dergistiyê

wê got,- ez li hîviyê nasekinim kû gazî min

bikin, bê gazîkirin jî ez zef rind zanim kû van rojên

giran welat li hîviya zarên xwe ye... Lê guman dikim

kû ezê vegerim, hizkirina te yê qewatê, per û baskan

bide min ... Li ber xwe nekeve, xezala min, ezê bi

5

serketî vegerim!..

Bi xwe jî nizanibû çiqas wext derbaz bûbû, gava

nişkê ve dengê li ber guhê wê ket. Li ber pencera wê

çîrke-çîrka berfê dihat. Tê derxist, dengê lingê meriya

hatin ber derê wê. Kiye gelo, dibe kû Anahîte girane,

hatine pey wê. Karê di van mitalan de bû, gava nerm

derî kutan. Di canê wê re êş derbas bûn, xofê girtê,

xwest bêje kiye, xeber lê biryan. Vê carê derî qayîm

kutan. Karê ji nav nivîna bazda, tişte avîte ser xwe,

ber bi derî çû.

- Kiye?

Dengê jina yê zirav bi Rûsî hîvî jê kir, kû derî lê

veke.

Karê derî vekir, jineke, kurkekî kin lê, xwe avîte hundur.

- Tu kiyî, evda Xudê, vê şevê, vê sar û sermê, ku de diçî? -

- Ez rêwî me, hîvî dikim heta sibê min û zara min sitar bikî!

Rêwiya qefilî bi tirs li wê dinhêrî, bêsebir li hîviya bersivê bû. Karê, metel mabû û lê dinhêrî, pêra-pêra ew bire odê, sivik-sivik çû-hat, xizmeta mêvana bêwext kir ... Jina ciwana qefilî ber pêsîrên xwe vekir, pêçeka zara xwe ya biçûk danî ser yanê, sekinî û li çavên Karê nihêrî, qey bêjî digot: "Tu dilê xwe nakî?" Karê ji rûyê wê tê derxist çî dixweze bêje, pêra-pêra ber dilê wê de hat.

- Na, na, venekişe!.. Ezê vê saetê odê germ bikim, we niha serma girtiye. Zû-zû çû-hat, agirê sobê gur kir, satila avê û çaydan danî ser. Heta Karê sobe vexist, mêvanê pêçeka zara xwe vekiribû, kincên wê diguhastin.

6

- Kure? -Karê ji dê pirsî û ser zarê de mêl bû.

- Kure, -dê got û keser rahîşt ...

- De niha bêje, tu kiyî, vê şevê, sar û sermê, dest dergûş daye serê vê rê, ku de diçî?

- Riya min dûr e, xûşka min ... Ez gerek îşev bighîştama stasyona cînar, wekî pê makîne biçûma, lê me bi zorê xwe vî gundî re gîhand ... Zivistana we jî mîna ya Rûsiya me sert e. Zaroka min tunebûya ... Dixwest tiştê bigota, li çavê Karê nihêrî, wextî xwe

biavîta pêşîra wê, wekî ewqas dilovan dor wê diçûdihat.  
Demekê wê û Karê li hev nihêrîn. Herdu jinên  
ciwan kerr û lal hev fem kirin ...

Salên şer giran bûn, zehmet bê hed-hesab pir bûn.  
Karê ji hatina mêvana bêwext ecêbmayî nema, rojên  
wisa bûn, wekî hîviya her tiştî bûyî. Mêvana bêwext ji  
dilovaniya Karê ruhdar bûbû, dilê xwe ber wê vekiribû  
derheqa xwe û zara xwe de gilî dikir ...

- Karê, xûşka min a ezîz, qedera me gişkan di van  
rojên giran de mîna heve ... Hîtlerê merîxur nehîşt em  
bi mirazê xwe şa bibin. Ez bi xwe ji Krasnodarê me. Ev  
çend meh bû min û Nîkolay deweta xwe kiribû, lê di  
ruyê vî şerî de her tişt teribî. Mêrê min jî çû. Diya min û  
bavê min hatin kuştin ... Ez bi halkî bûm, wextê em  
îşxal kirin ... Çi bêjim, xanga min, ev zelûliya kû me  
kişandiye, bira neyê serê gurê çîyan. Vî tîfalî stukura  
min xwar kiriye.

Mêvana Karê digot û pêra jî hêsir dibarand. Karê jî,  
qey bêjî xûşka xwe ya helal dîtibû, pêra dikewgirî. Serhatiya  
jiyana wê, mirazê wê yê nîvcî hat bîrê, kela dil  
tijî bûbû, xwe negirt ...

Wê şeva zivistanê ya sar herdu terecana dirêj qise  
kirin. Karê jî di derheqa jiyanê xwe de gilî kir. Qedera

7

jiyana herdu jinên ciwan, rastî bi gelek tiştî ve mîna hev  
bû. Dayika Rûs a ciwan wê demê wisa ruhdar bûbû, te  
digot qey wê xûşka xwe ya helal dîtiye. Şev îdî dereng  
bû, zara wê razabû. Karê rabû, çî kû mala wê de hebû,



danî ber mêvanê, ciyê wê çêkir. Berî razanê, bi xwe jî nizanibû çima, ser zara mêvana xwe de mêl bû, demeke dirêj li wî tîfalê bêsiûc nihêrî. Paşê ji dayika zarê re got, wekî razê, kesiriye û bi xwe jî serê xwe danî, wekî şefeqê zû bigihêje xebata xwe.

Bûyerên rojê yên giran Karê ji hal de xistibû, pêrapêra di xew re çû ...

Nû gewrayî ketibû sibê, ew ji xewê rabû. Berê ewlîn guhê xwe da derve, bayê bakû rî sar dîsa dihat û dikire bager. Karê berî derketina xwe îşmarî da mêvanê, wekî nebê-nebê bê wê diçe. Wê ciyê şîr û xwarinê nîşanî mêvana xwe kir û çû, wekî bigihêje Anahîta bedhaL.

Wê rojê temamiya gund êdî bi hatina mêvana Karê dizanîbûn. Perî ya hevala Karê nehîşt ew wê rojê bixebite, dewsa wê ma, wekî ew here bigihêje mêvana xwe.

Temamiya rojê Karê mêvana xwe ve gîrobû, wê qey digot xizmet bi xwenga xwe ya ji dê û bavê dike, heta nîvê şevê dîsa qise kirin.

Sibetira din, berbangê, wextê ew mîna hercar dîsa zû n •  
raoû, çilo bû sekinî, gava dît, wekî nivînê valane, zaroka biçûk jî xweş-xweş razaye. Demekê tevhev bû, paşê fikirî, qey derketiye der ve. Lê kaxeza qatkiriye ser pêçeka zarê ew da sekinandinê. Wexteke dirêj wê cesaret ~edikir kû hilde. Wextê wê kaxeza qatkirî vekir û xwend, destê wê berda hatine xwarê, hêdî ber pêçeka zarê rûnişt û ji kula dilê xwe re hêsir barandin. Mêvana wê nivîsibû: "Ez zanim xûşka min a ezîz, ser

derd û kulên te yên giran de min derdekî mezin jî zêde kir. Ji bextê min bû, an jî bextê te, wê şeve riya min bi mala te ket? Min wisa zanibû kû ez hatime mala xûşka xwe ya helaL. Bawer bike Karê, ez rast dibêjim, hesina dilê min jî min şaş nake. Wextê te derî li min vekir û min tu dîtî, şewat bi dilê min ket, min wa zanibû kû ez rastî xûşka xwe ya windabûyî hatime, kû wextê îşxalê me hevdu winda kiriye. Wê demê, min tê derxist, wekî ez û Saşkaê xwe ber destê xûşkeke bi bawer in. Xûşka min a windabûyî sax be, an jî mirî, ezê vir ha de zanibim, wekî xûşkeke min a helal li gundekî Kurmancan yê dûr heye ... Xanga min a ezîz, tu niha difikirî, wekî min çima ev yeka kir. Wextê te serhatiya jiyana xwe ji min re şilovekir, guhê min rind li ser te bû. Hema wê demê jî, nizanim çima, fikra min re derbas bû, wekî keriyek dilê xwe li ba te bihêlim ... Ez bawerim, tu yê wisa nefikirî, wekî bi vê kirina xwe min xwestiye barê xwe sivik bikim, wekî ji destî tengasiyê ez zara xwe davêjim. Na xêr! Ev du rojên mêvaniya min li ba te, dinyake nû bû bona min. Dilovanî û xemxuriya te ji ya xûşka helal çêtir bû. Wê demê, wextê te derheqê jiyana xebata xwe, bi min re şilovekir, min qirar da, wekî Saşkaê xwe li ba te bihêlim û bi tev wan zarên din wî jî xweyî bikî, yên kû rûyê vî şerî de bê dê û bav mane ... Xûşka ezîz, ji min re weke mirinê giran e, wekî vê qirarê qebûl dikim. Lê xemxurî, dilovanî, xebata kû tu pêve mijûl î, dilminiyê dide min, wekî Saşkaê min yê

ber destên bibawer mezin bibe. Ew, çi kû faşîstên devbixûn anîne serê dê û bavê min û bi hezara-hezara merivên din, min bi çavên xwe dîtiye, xûn ji dilê min dikişe. Rast e, hûn dûrî pêşeniya şer in, lê telaya bûyerên faşîzmê hûn jî tem dikin. Ez ewledê xwe li ba

9  
te dihêlim bona wê yekê, wekî herime pêşenyê, sîlehê hildim, tevî Nîkolayê xwe û Cemalê te şer bikim, bi destê xwe heyfê ji wan xûnxuran hildim! ...

Emê vegerin? .. Gelo çevê min ê dîsa li Saşkaê min bikeve? Nizanim!. ..Lê wextê difikirim, wekî ewledê min di destên bibawer de ye, ev yeka gumana mezin dide dilê min ...

Tu jî jinî, tuyê texmîn bikî, wekî çiqas zehmet e wextê dê ji ewledê xwe diqete. Va îdî gewrayî ketiye sibê. Tu û Saşkaê min razane, lê min çevên xwe nedaye serhev. Kela heyfhildanê tavetiyê nade min. De ma xatirê te, bona vê kirinê, min gunekar neke!.

Hesab bike, wekî Saşa, ewledê te û Cemal e. Dibe kû vegerim, an jî na. Ez kû venegerim, ewledê min li te xweş helal be (ez gazî Xudê dikim, wekî Cemalê te sax-silamet vegere), bira mirazê we pê bê... "

Evdokiya Alêksêvîa

Dobrînîna. 14'ê Sibatê, 1942.

Karê derkete ber dêrî, seqema ba û bagerê li ser çevê wê xist. Zû-zû derî girt û bi lez vegeya odê, dîsa sergîn kire sobê. Bû îske-îska kurikê biçûk. Nêzîkî wî bû, xwest hilgire, lê digot qey deh meriya ew paş de

dan. Bi herdu destan ser çevên xwe girt, kewgirî bû û li çokê xwe xist: "Vê çi anî serê min, zara xwe hîşt, çû, ezê çawa bikim? Xelq, der-cînar, heval-hogirên min wê çi bêjin, ezê devê kê girê bidim?. Karê di van mitala de bû, gava Saşaê biçûk giriya, dest û lingên xwe yên bêtaqet bir-anî, wekî ji pêçekê azad bibe. Karê hêdî ber bi wî çû, ji jor de lê nihêrî: Wî tîfalê porzêrînî çavsût ji nişkê ve dengê xwe birî, zûr bû li Karê nihêrî. Qey bêjî pêleke alava germ dil-hinavê wê terecanê hilgeriya, ber-bistanê wê tije bûn. Pêçeka zarê hilda, bi

10

sîngê xwe ve givaşt, bîhna zarê ya xweş kişand, xêlekê wisa sekinî, paşê pêçeka wî hêdî danî ser cî-nivînê vekirî û bi lez paçikê wî yên şil guhastin.

Fikran rê nedidane hev, çawa bike, bi ku de here, bi kê bişêwire?

''''''''

Bi xeyset û natûra xwe ve, Karê ji dor-berê xwe carekê ve cuda bû. Ew rastgo û rastenebû, pêra-pêra difirî ruhê meriya, dîtinên xwe rû bi rû ji meriyan re digot û ew gilî gelek cara serê wê diêşand.

Kubarbûna vê jinê di nav her kirineke wê, her gotineke wê de wisa kivş û eşkere bû, wekî carina, wextê bersiva wêye sert jî, yê pêşber nikaribû jê bixeyde, dilê wê keve, lê hilê. Bi saya vî xeysetê xwe, ruhsivikaya xwe zû dihate hezkirin, di xebatê de an jî di koma hevalan de pêra-pêra dihate kivşê. Hê xeber di devê te de bû, wê tê derdixist kû çi dixwazî bêjî û bersiva wê hazir

bû. Heval-hogira caran bi rengê wê yê pêşiyê texmîn  
dikirin,. wekî gotin anjî kirina Karê wê ji aliyê kesên  
gund, an jî di kollektîva xebatê de neyê qebûlkirinê, lê  
paşê bi xwe didîtin, wekî fikra wê ya aza û bi cesaret  
çiqas kûr û baqile, çawa rind tê qebûlkirinê.

Karê ne bedew bû. Lê bejn û bala wê ya blind, dêmê  
wê î mîna rengê genimê sor, gerdena wê û devê  
xweşik, çevên ne ewqas gir, lê jîr û baqil, eniya kever,  
porê reşe qey bêjî mîna hiriya şehkirî harmoniyeka  
wisa çê dikirin, wekî heta mêrên mezin jî nikaribûn  
bêxem rex wê re derbas bibin. Karê ev yeka rind  
texmîn dikir, zanibû, ku çevên geleka lê ye, lê wê dil  
nedabû kesî. Di kuçê de, an jî li ser xebatê, li ser

1 1

kaniyê, an jî li çolê, wextê yekî ew dida xeberdanê, disekinî,  
bi cesaret û eşkere bersiva wî dida û tu kes jê  
nedixeyîdî, kesera kûr radihîştin, wekî nikaribûn riya  
dilê wê bibînin û bi ser teng-berê wê ve bin.

Dema here zehmet de wê timê riya here rast didît,  
şêwra here baqil dida. Dîrektorê êtîmxanê - Badalyan,  
bê Karê tu şêwr darî destpênedikir, pirsên berpirsiyarî  
û konflîktan de gotî Karê timê li wir bûya ...

Awha, Karê cara pêşî di jiyana xwe de ber pirseke  
gelekî zehmet sekinîbû û nizanibû wê kîjan riyê  
bibijêre. Karê timê, lê vê carê bi taybetî, li ser fikra  
xelqê difikirî: Çawa jî nîbûya, bûka vî gundî bû. Belê  
raste aktiv, cesûr û rastgo bû, ruhê jiya nû ve dijît û  
der-cînara, qewm-pismaman xeysetê wê rind zanibûn,

lê di vê pirsê de wê rê ji riya dernedixist, nizanibû çawa bike.

Karê di nav van mitala de bû, lê Saşaê biçûk ling û destê xwe yên bêtaqet ji pêçekê derxistibû, azayî standibû û gixe-gixa wî bû, dilîst. Wê zûtirkê ew pêça, hilda hemêza xwe, di odê de çû û hat. Paşê zaro danî, çay germ kir, nîv stekan şîrîn kir û pê hingil da wî tifaî, li kêlekê rûnişt, pê destan hejand, heta di xew re çû. Wê pêçeka zarê rind nixamt û lezand ciyê xebatê ... Mecîdê Keleş -kîlervanê êtîmxanê, hema li ber derî rastî Karê hat. Herdiwan demekê li çevên hev nihêrîn, lê Karê mecal neda Mecîd kû xeber bide, wî dixwest jê bipirse, çima ew ji xebatê dereng ketiye. Karê qet berfa ser xwe jî daneweşand, bi lez ji wî pirs kir.

- Badalyan li vire?

- Erê! Çi bûye, Karê? Mecîd jî pê re vegeriya hundur, lê Karê bersiva wî neda û pişt derê pêşber ve winda bû. Ew demekê li ber derî metelmayî sekinî.

12

- Mecîd hela tu li virî? - Terbiyetdara êtîmxanêye sereke- Vîktoryayê, jê pirsî,- Ne axir gişt hîviya tene, ji kîlerê ewqas tişt gotî bê stendinê. Badalyanê derkeve, wê bi ser te de hêrs be - Lê wextê şik çû dilê wê jî, dîsa jê pirsî:

- çýo ye, çýo bAuye ;.ý..

- Nnna!..

- Lê çima wisa metel sekiniyî, rast bêje, çi bûye?

- Nizanim, -ewî tevhevbûyî got,- Karê nû hate xebatê,

lezo-bezo çû ba Badalyan, tişteke bûye, lê ji min re negot.

- De pak-pak, te jî ji xwe re menî girt, wê çi bibe? - Zû here bighîje keçikan, ber derê kîlerê li hîviya te ne, vê sur-sermê niha cemidîne, gunene!.. Here, ezê pê bihesim, paşê ji te re bêjim!.

Wextê Mecîd jê bi dûr ket-çû, Vîktoryayê di ber xwe de bi xwe xwe got "Jê hiz dike, wê çawabe halê wî?" Hema wê demê Karê dîsan wisa bi lez û bez ji oda pêşberî daîra dîrektor derket û rastî Vîktoryayê hat, kela wê tije bû, xwe avîte pêsira wê:

- Vîktoriya, çi rind bû min tu dîtî, gilîkî min î ferz heye ji te re bêjim.

Vîktoriya, kû Karê, hêwerza wê û tevhev bûna wê dît, ecêbmayî ma. Wê Karê rind nas dikir, zanibû wekî ew yeke li ser xweye, di rewşên herî giran de jî xwe winda nake, zû rê ji riya derdixe. Lê niha ... Têderxist, ku tişteke hatiye serê wê.

- Karê, çi bûye?.

Karê bersiva wê neda, milê wê girt, ber bi oda razanê ya nêzîk çûn. Di odê de kes tunebû: Zaro çûbûn kû taştê bixwin ...

- Lê wê çawa be? -Pey şilovekirina Karê Vîktoryayê

13

metelmayî jê pirsî.

- Ez bi xwe jî nizanim çi bikim ... Hûn rêkê ji min re bibînin!.. Min ji êşa dilê xwe dixwest ji Badalyan re bigota, lê pak e tu rastî min hatî ... Min kurik tenê li

malê hîştiye, hatime, gune ye, wê hîşyar be, bigrî, -  
Karê got û kela wê tije bû, xwe negirt, giriya.

- Tu here malê, Karê,- Vîktoryayê texmîn kir, wekî li  
ber pirseke gelekî nebaş sekiniye, -ezê şuxulê te  
bispêrime Satîkê, heta em binhêrin ka em çawa dikin ...  
Karê şûn ve vegeriya malê.

Li ser çokan Êsivê xizekçî, qamçiyê xwe bi hewa ve  
bakir û fîtande hespan. Hespên cexur yên têt,  
bezand. Bi bayê hespan re û bagera wê rojê pey xizekê  
dûmana berfê rakirin. Wextê kû xizek nêzîkî malên ji  
gun dût bû, Êsiv bi serê hespan girt. Dengê zengilê  
hustiyê hespan û Êsiv gihîştin Karê û wê pêçeka zarokê  
hemêz kir, ji malê derket.

Karê û zaro li ser xizekê cîwar bûn, Êsiv fîtande  
hespan.

- Karê, ezê te bighînim gund, paşê herim nehiyê, ji  
wir mirovan bînim, - Êsiv vegeriya, gote Karê,- tu zanî  
serokê me yekî çiqas bîhn teng e, du saet wext daye  
min, dibêje qey ez şofêr im, xizeka min jî otomobîl e.  
Malava nizane, wekî hesp jî ruhber in, xûn û goşt in,  
vê bagerê, vê qiyametê!. .. De tişt nabe, zehf jî gotiye,  
ezê te bigîhînimê cî!. .. Tu zanî ez qedrê te çiqasî  
digrim! ..

Karê ji ber bayê xizekê, gelek xeberên Êsiv nedi-  
14

bihîst, di mitalên xwe yên kûr de bû, di derheqê pirsên  
din de difikirî.

Sar bû, lê kurkê kû Êsiv dabûyê, ew û zaroka biçûk



rind sepe kiribûn.

Wê çawa bersiva diya xwe ya feqîr bide, der û cînarê  
çi bêjin, Karê xwe bi xwe difikirî. Ev zaroka ji kêderê  
hat? Hela ji diya xwe re her tiştî dikare rast bêje, lê  
xelk? Derd û kulê wan ne bes bû, derdekî din jî zêde  
bû. Derd-derd li vir pirsê nav û namûsê ye!.. Wê çawa  
bike, devê kê girêde, hezar xêrnexwaz hene!.. Lê Riza  
û Mecîd, kû mîna qereçiya li pey wê digerin?. Kela  
Karê tije bû, serê xwe da ser bîhna Saşayê razayî, hêsir  
ji çavan barîn. Zû xwe girt kû Êsiv texmîn neke; ê,ê,ê  
kî çi dixwaze bira bêje, -di dilê Karê de dîsa rastiyê  
xeber dida. Êsiv nişkê ve lê vegeriya, jê pirsî:

- Karê, eyba pirsê tunebe, ev zara kê ye di hemêza te  
de ye? Min di pêşiyê de dixwest pirs bikim, lê ev zarê  
êomxanê nîne?.

Karê, kû li hîviya pirseka weha bû û zanibû, ku di  
derheqê vî karî wê ji vê pirsê dest pêbe, dirêj nefikirî,  
got:

- Zara min e, birayê Êsiv!.. Êsiv metelmayî lê vegeriya,  
kû ji rûyê wê tiştê texmîn bike, gelo rast dibêje?  
Ne axir, destgirtiyê Karê ... Zar ji wê re ji ku hat?  
Cemalê destgirtiyê wê ev ji salekê zêdetir e çûye eskeriyê,  
weha jî dibe?. Lê... Wî nedixwest di derheqê wê  
de wisa bifikire. Zanibû, ku kes nikare li ser siya Karê  
. de here. Pêra jî wî qey bêjî kumreşî kir, lê newêribû  
xwe eşkere bike. Piştî Karê lê bû, vegeriya, bi curekî  
Karê û zara hemêzê nihêrî, qamçiyê xwe li hewê bakir  
û fîtande hespan.

.....

Ûsiv xortekî kû gundiyan jê hez dikir, bi bejn û bal û kemal bû. Di malê de, di nav der û cînar û hevalan de berbuhêr û qedirgir bû. Lê, heyf, bi çavên xwe ve belengaz bû. Çavên wî yên reş î gir dûr nediqîşirandin, şevkorîbû. Ji ber vê yekê jî ew ji eskeriyê azad kiribûn û di kolxoza gund de dixebitî. Nanakirina wî tunebû, waxtê cînarekî gazî bikira, kû ji bo şuxulekî alîkariyê bide wan. Wan salên şer ên giran, kû mêr di gund de lap kêmbûn, hemû mal jî hewceyî alîkariyê bûn. Ûsiv xîret dikir kû dilê kesekî ji xwe nehêle.

Bi şev dereng dihate malê. Almasta diya wî ya bêsehet bi şevan belengazê ranediza kû hetanî kurê wê nehata mal. Westiyayî û kesirî dihat. Dê kerî nanê ceh û derdane şorba rijî datanî ber wî, wî çend kevçî xwarina germ dixwar û paş de vedikişiya, zef rind zanibû, wekî dê û xûşka wî ya biçûk Asê, niha birçîne.

- Bixwe, lawo, tu ji sibê ve birçî yî!..

- Na, dayê, ez têr im, bide Asê, bila bixwe, min îro li nehiyê nan xwar.

Ûsiv havînê firxûn, zivistanê jî xizek dajot, xebata wî giran bû. Wî hespên xwe wisa xweyî dikir, wekî di hemî nehiyê de hespên wî bi tiliya nîşanê hev didan. Wextê xizeka wî di nava gund re diçû, dengê zengilên hespên wî gişka dibihîst, teva zanibû, an serokê kolxozê diçe nehiyê, an jî ji nehiyê merivên hukumatê têne gund, lewra serok tenê bi xizeka Ûsiv digeriya, lê

xebatkarên nehiyê yên joreke an jî mêvanên taybetî bi xizeka wî dahat û diçûn.

Çavên gelek qîzên gund li Ûsiv bûn. Rast e, ji çavan belengaz bû, lê bi bejn û bala xwe ve bedew bû, ser-16

wext Û laqirdîhezbû.

Waxtê bavê wî çû rehmetê, ew derbasî ser xebatê bû û xwe ji tu tişû neda paş. Niyet û meremên wî, kû here di însûtûtê de bixwîne, mîna xewna şevê vala bûn ...

Waxtê Cemalê hevalê wî pey şîraniya xwe çû Kara destgirtiya xwe anî, wekî dersxana deha gundê wan Mêrgesorê de kuta bike, qey dibêjî melek ek hate gund. Mêr û xortên gund bi bejn û bala Karê ya zirav, bi demê wê yê qemer û çavên wê yên belek, kenê li ser demê wê ve heyr-hijmekar man. Karê mîna xezala çiyayê beyanî timê tîk, serbilind diçû û dihat.

Daweta wan hê nekiribûn. Karê her roj ji gund peya, tenê, caran jî bi tev hevalan dihate mektebê. Di pey dersan, Cemal ew rêvedikir. Dê û bavê wê destûr dabûnê, wekî here mala destgirtiyê xwe. Di herdu gundan de jî zanibûn, wekî ewe destgirtiye û di vê yekê de tişteki şaş nedidîtin. Wê qedrê xwesiya xwe wisa digirt, wekî tu dibêjî kesekî ji wê malê ye. Ji dîtin û edetên Kurdan dervediket û bi saya ruh sivikayî, xeysetê xwe yê delal xwe dida hezkirinê.

Ûsiv, kû xortekî qedirgir, bi nav, namûs û xîret bû, bi dil şabû, kû Cemal qîzeke wisa bedew û baş ji xwe re bijartiye. Qet di fikra wî re jî derbas nedibû bi çavekî

xerab li Karê binihêre, an jî niyeteke xerab di dilê wî de pêş de bê. Lê bejn û bala Karê ya bedew, rengê wê yê alavî ne tenê dilê Ûsiv, lê dilê xortên gund hemûyan jî hinavtibû. Ûsiv guh nedida dengê dilê xwe. Wî qedrê Cemal gelekî digirt, ji xortên gund giştan zêde ji wî hez dikir. Lê wexta şer destpêkir, bi tevî gelek ciwanên gund Cemal jî çû pêşiya dijmin şer bike û demeke dirêj deng û xeber ji wî derneket, Ûsiv bi dilekî qenc li ber xwe diket: Wî bi dil dixwest Karê û Cemal bigihîjine  
17

mirazê xwe. Pêşiyê di dilê wî de hesîna hizkirinê ber bi Karê tunebû, wî bi xwe ev yek texmîn dikir, lê nizanîbû çima ew terecana ji hişê wî dervediket û ew hesîna şiriî bere-bere di awazê xwe de duguhast, bi tehrekî din xwe dida hesandinê. Ûsiv xîret dikir kû xwe nede kivşê, ew yek bi zinêkarî hesab dikir, di dilê xwe de Mecîd û Riza jî gunehkar dikir, ku mîna qeratiya li pey Karê digerin. Eger berê xortên gund vedikişyan, xwe digirtin, nêzîkî Karê nedibûn, lê pey wê yekê, wextê kaxeza Cemal ya reş hat, her yekî di hindava xwe de dixwest kû bi Karê şêrîn bê, menê û Cemal ji destê xwe bernedidan pê re xeber didan, xeber di ber re dihavîtin. Ûsiv jî qirar dabû, ese Karê bide xeberdanê û merema dilê xwe jê re bêje ...  
Ji wê xebera nebixêr gelek wext derbas bûbû, lê reng û beşera Karê ya wextekê bi eşq û şa qet xweş nedibû, qey dibêjî Kara berê çûbû, yeke din hatibû.  
Rast e, dîsa wisa jîr û bi xîret bû, lê ne mîna berê xeberxweş

bû, bersiva meriyan kin û rast dida û dirêj li  
ba kesî nedisekinî... Xênjî malê û xebatê tu nedîçû  
cihekî din, tenê caran diçû, teseliya Seyrana diya  
Cemale nexweş dikir, kû ji bo wê bûbû gumaneke  
mezin. Wê bîhn û bîra Cemalê xwe ji Karê hildida,  
Karê jî di hindava xwe de ew yek ji Seyrana pîr hildida.  
Sala kû dest bi şer bû, çend meha şûnde li gundê  
Mêrgesorê êtîmxane vekirin û ji ciyên din zarên kû bê  
dê û bav mabûn, hanîne vir. Dewletê ew xweyî dikirin.  
Berî çûyina xwe ya eskeriyê, Cell}.albi diya xwe û diya  
Karê dişewire, wekî kû ji bo Karê vala nemîne, baş e  
kû di êtîmxanê de bixebite. Karê jî ji vê yekê dilxweş  
dibe. Di pey çûyina Cemal, ew tê vir, dest bi xebatê  
dike, demekê li ba Seyranê dimîne, lê paşê dîrektorê  
1 8

êtîmxanê odeke biçûk, kû nêzîkî êtîmxanê bû, dide  
wê, bo kû awqas dûr neçe-neyê. Caran şev nivê şevê  
diçû-dihat. Lê Karê tu cara Seyrana diya Cemal ji bîr  
nekir, rojê çend caran diçû ba wê û alîkarî pê dikir.  
''' ''' '''

Seyrana diya Cemal jineka mêranî ya bi qedr û qîmet,  
di pey çûyina kurê xwe de ew pir hate guhertin ..  
Nexweşiya wê ya berê hê .lê giran bûbû, sebra dilê wê  
Karê bû. Her tim, wexta kû kurê wê dihate bîrê, kela  
wê tije dibû û nikaribû xwe bigirta, gazî Kara bûka xwe  
dikir, li kêleka xwe dida rûniştandinê, serê wê bi sîngê  
xwe ve digivaşt û jê re digot:

- Wextê kû tu li kêleka min î, ez zanim kû Cemalê

min li rex min e, bîhna wî ji te tê. Gelo çima mektûba wî dereng ket?. Qe nebe yê ji te re binivîsiya ... Kela dilê Karê tije dibû, lê xwe digirt. Zanibû, wekî dilê Seyrana xwesî nexweş e, di ber dilê wê de dihat, digot:

- Bêsebir nebe, inka Seyran, Xwedê bi rehm e, em ê zûtirekê mektûba Cemal bistînin... Çima Cemal nizane em bêsebir li hêviya mektûba wî ne? ... Erê, qîza min - Seyranê ew ji hemêza xwe bernedida, digotê, - Cemal zane, tu li vir î, gelekî li hêviya mektûbên wî yî... Mala Hîtler wêran bibe, çawa warê me sar kir, mirazê ciwanan di çavan de hîşt ...

Roja kû Seyranê bimire, mektûba Cemal hat. Karê xêleke xurt mektûb sêncik xwe ve givaştibû, venedikir. Perîşana diya wê ew çend roj bû hatibû, zanibû Seyran bedhale, ji ber nivînên wê ranedibû.

Wextê êvarê der û cînar berhev bûbûn, Sefoyê şêx û çend kalên din bi hev şêwirîn û qirar dan, wekî ji

19

mabû, kû ew şîretên wisa dide wê.

- Vîktoriya, tu bi xwe zanî, ez çiqasî qedrê te digirim ...Ez zanim jiyan zehmet e, kes nizane ji kê re bi çi tehrî li hev tê. Kesera Cemal wê heta heta di dilê min de bimîne. Ji bo min gelekî giran e, bawer nakim, ku Cemal îdî ne li rûbarê dinyayê ye. Rast e, kaxeza wî ya reş hatiye, lê ez bawer nakim, na, na, Cemal heye . Dengê wî timê li ber guhê min e, li ber dilê min e . Dengekî nexuyane timê ji min re dibêje kû ew heye . Bibaxşîne, xwanga min, min hertim şîretên te girtine,

lê di vê pirsê de... Na, Vîktoriya, di pey Cemal... Tu kes, tu kes dewsa Cemal nagire!..

Vîktoriya metel mabû, li wê dinihêrî û li ber xwe diket, kû di derheqê wan pirsan de gilî vekir. Wê mîna ewlêda xwe ya helal ji Karê hez dikir. Lê vê carê ... Vê carê Vîktoriyayê texmîn nekir, kû nêzîkî sîmê dilê wê yê narîn bûye, birîna dilê wê yê ku hê nekewiyayî êşandiyê. Lê pê re jî nizanibû çima Karê, kû timê kûr û dûr pirsên jiyane fem dikir, vê carê gumana xwe bi tiştê bêguman re girê dida.

Wexta xizek li ber derê mala bavê Karê sekinî, Perîşana diya wê ji dengê zengilên stuyên hespan pêra pêra derket der, çav li qîza xwe ket, bû zarîna wê, xwe havîte pêsîra Karê.

- Pîî, çavên diya te kor be, Karê, ev tuyî, vê qiyametê çi bûye kû tu hatî? .. Ev zara kê ye? .. Hahanga pêçeka kurik ji destê wê hilda, bire malê.

- Ez gelekî sipas dikim, Êsiv, te cefa dît, -Karê gote Êsiv û xwest ew bê malê, lê xwe bi xwe jî nizanibû

22

çima, xwe girt.

- Çi cefa, Karê, ez hazirim ji bo te heta perê dinê herim!.. Tê kengê vejerî, ez bême pey te?.

- Na Êsiv, zehmetê nebîne, ne pêwîst e, -Karê demekê kerr li Êsiv nihêrî, paşê got, - Êsiv were hundir, te serma girtiye, parî nan bixwe, paşê bi rê bikeve, - got û qey dibêjî kû ji gotina xwe poşman bû, serê xwe berjêr kir ...

- Mal ava be, tu zanî ez î bi lez im!.. Lê te negot, ka tê kengî vegeî?
- Ez divê sibê zû li ser xebatê bim, - Karê gotê,- wê heta sibê xweş be, riya saetekê ye, tu zehmet nebîne.
- De, bi xatirê te, dereng el.. Sibê li hîviya min be, Karê tu bêî min bi rê nekevî, - Ûsiv got û dîsa fîtande hespan. Wê demê dengê Perîşanê ji hundir hat:
- Karê hûn çima nayêne hundir, xort kiye, gazî bike bira bê, xwe germ bike, parî nan û xwarin bixwe. Xeberdan hê di devê wê de bû, Karê hate hundir.
- Ev kurê kê bû, min pak dîna xwe nedayê, çima te hişt ew wisa vegere, şerm bû, lawo, lê tiştên wisa dibin?
- Çima ez hawqas bêfam im, inkê, tu ji min re wisa dibêjî. Min jê re got, nehat, lez bû ... - Karê zû-zû kincên xwe yê ser ji xwe xist, li ber sobê rûnişt, kû Perîşana dê nû dar kiribûyê û gurr dişixulî. Perîşanê, kû Saşê biçûk danîbû li ser nivînê vekirî û kûr razabû, ji Karê pirsî:
- Karê, te çima ev zara êtimxanê bi xwe re aniye?
- Na, dayê, ew ne zara êtimxanê ye, di êtimxanê de zarên weha biçûk tunene.
- Lê?
- Ez jî nizanim, dayê, -Karê got û dîsa kela xwe
- 23
- negirt, bi herdu destan bi serê xwe girt û bû îskîniya wê, kerr giriya.
- Weyla çavên diya te kor bûyê, -Perîşanê serê qîza



xwe hemêz kir, di ber dilê wê de hat,- bi van êtîman re emrê te pûç bû ... Belkî kilîta reş bi devê Hîtler bikeve, di ruyê vî şerî de ev xelqa hemû çawa dizêre!.

- Karê lawo, çima di êtîmxanê de cî tunebû, te ev tîfal di vê sur û sermê de bi xwe re aniye vir?

- Ew ne zara êtîmxanê ye, dayê, -Karê got û li dê nihêrî, ew zara jineke Êris a rêwî bû, li ba min hîşt, lêxist çû ...

- Tu çi dibêjî, lawo, ez fem nakim, -destên Perîşanê di ber de hatin, vegeriya, li çavên Karê nihêrî, dîsa jê pirsî, -ka hela ji min re bêje ev çi giliye tu dibêjî, ûrisa çi, halê çi, ûris ji te re ji ku hat, derdê me ne besî me bû, eva jî ser de?

- Dayê, di vê pirsê de gunehkariya min tune! Sebir bike, ezê ji te re yeko-yeko bêjim! -Wê dîsa serê xwe kire ber xwe, xêlekê kerr fikirî, paşê dûmayî kir:

- Mîna hercar ez nû ji xebatê vegeriyabûm. Xazila ez wê şevê qet nehatima malê ... Keçikan ji min re got, wekî idî dereng e, li ba wan bimînîm, lê min da qama xwe ... Dayê, kî di şûna min de bûya wê wisa bikira, ew feqîr û zara wê qefilî bûn ... Karê hûrgilî bi dê re gilî kir û serê xwe kire ber xwe, li hêviyê sekinî, ka wê diya wê çi bêje.

Perîşana feqîr ev kû bihîst, xwe negirt, li herdu çokê xwe xist, bû lûbe-lûba wê, di nav malê de çû-hat, pêra jî digot: " ... Ez porkurê, çawa bikim, ev çi tenîbû hat bi me geriya?. Emê çi bersiva xelqê bidin?. Bextreşê, bextreşê ... Bextê hebûya, mêrê te yê li ba te bûya ... Di

rûyê vî şerî de ewledê xwe havîtiye ... Lê, havîtiye-  
24

havîtiye, -ew nişkê ve bi hêrs vegeriya aliyê qîzê, - te  
çima ev tîfala hildaye-haniye vir, ezê ji xelqê re çi  
bêjim?. Te çawa haniye wisa jî paş de bibe!.. Hawqas  
êtîm an xweyî dîkin, viya jî xweyî bikin!.."

Karê demekê, bêdeng li çavên diya xwe nihêrî, ew jî  
difikirî, eger vî tîfalî li vir bihêle-here, diya wê yê ji dercînanan  
re çi bêje?

Bêje neviyê wê ye? Wisa jî ji hezkirinê wê ji bo xatirê  
wê û Cemal edetên miletiyê neda ber çavên xwe, rê  
dayê kû bê def û dewat here mala destgirtiyê xwe, di  
gundê wan de di dersxana dehan de bixwîne ...

- Lawo, -dê dîsa li qîzê vegeriya, -çima çavên diya te  
kor bûye ... Tu zanî tarq-farqa min tuyî, eger ev zara te  
ye helalbûya, min ê ew mîna roniya çavên xwe xweyî  
bikira ... Çima tu nizanî, lawo, em wisa jî ji nav devdibara  
demayên, hezar cure giliyan dibihêm ... Mêrê te  
çû, venegeriya, belkî mala Hîtlar kavla kulêbe, dûrî  
minî, yek dibê ha, yê din dibê ha ... Rast e, ez ji bo nav û  
namûsa te serfiraz im, lê ez dikarim devê xelqê girê  
bidim? Ev bes nîne, te eva jî di ser de hanî kire bela?

- Dayê, -Karê bi kela dijî vegeriya li aliyê dê, - wisa  
dixuyê kû tu ji min bawer nakî, ji gotinên xelqê bawer  
dikî? -got, demekê sekinî, qey tu dibêjî destekî nedxuya  
ew defandin ber bi kurikê razayî. Hilda hemêza xwe,  
bi xwe ve givaşt û xwe negirt, giriya. Dê kû ev dît, dilê  
wê jî tijî bû, serê Karê hemêz kir, bi kelogirî jê re got:

- Megirî qîza min, -ew ber dilê xwe de hat, - hela rûnê, em aqil bidine aqila, ka em çawa bikin? Xeberdan di devê wê de bû, Geveza cînara wan di dêrî de hat. Perîşanê û Karê, kû rind ha ji xeysetê Gevezê hebûn, xeberdana xwe guhastin. Karê zaro hahanga danî ser nivîna, hêsirên çavên xwe zû paqîş kir û li ser 25

kursiya nêzîk rûnişt, lê Perîşana dê çû pêşiya Gevezê, bi zarê şirîn ew keremî hundir kir:

- Were rûne, xuşka Gevezê , Kara te jî eva lezeke hat!...

- PîL. Tu ser bi çevên min re hatî, Kara min, -Gevezê zimanpenî gotê, bi herdu destan bi serê wê girt û sûretê wê yê hê ji hêsiran şil ramûsa, -Xwedê bi xêrke, qîza min, çima wisa pirçûkiriya, tu tişt nebûye? -Gevezê bilind-bilind got û vegeriya, li pêçeka kurik nihêrî, -pî, çi zareke rind e, Xwedê xweyî bike, zara kê ye?

- Xûşka Gevez, Kara te hinekî bêkêf e, -Perîşanê ser re xarand, -bi çi xizmetê hatî?

- Qe, hema wisa, xûşka Perîşan, -min got ka binhêrim halê te çawan e!

- Halê min yê çawa be, Xwedê mala sebeba xirab bike, kû em kirine vî halî. Perîşanê ev gilî bi curekî wisa got, wekî Gevezê texmîn kir, kû hizûra wê, wê demê di mala wan de nayê xwestin, hîşt-çû.

- Gevezê niha temamiya gund pê bide hesandinê, - Perîşanê kire wişe-wiş û di nav malê de çû-hat, -lê wê çawa-bibe?

- Çima min dizî kiriye, qavî kiriye? Gevezê here çi bêje? -Karê bi hêrs got, -inka min a ezîz, -ew di ber dilê dê de hat, - çima tu min nas nakî? Çima bi gotina hinekên din ...-Kela wê tijî bû, xwe negirt, -kî çi dixwaze bira bêje, eniya min vekiriye!

- Çima wisa dibêjî, lawo, em bi xwe li serên çiyar 'A , na)ýn.●●

- Ez zanim tu dixwazî çi bêjî!.. Zarê bibim, bidime êtîmxanê, pêsîra me jê xelaz bibe. Lê êtîmxane jî zarên awha biçûk hilnade, bidime hinekên din, erê? Ez di derheqên van yekan de fikirîme ... Dixwezî, ez rêka 26

here hêsa ji te re bêjim? Em vî tîfalî bi pêçekê ve daynin ser berfê, saetek jî nakşîne, pêsîra me yê jê xelaz be, - wê got, bi kela tijî ber bi pêçeka kurikê biçûk çû, kû hîşyar bûbû, çirûsiya lempê dinhêrî. Serê xwe danî ser pêçekê, azayî dan hêsirên xwe, kû xule-xul bû dibarîn. Te digot qey Perîşanê çûbû dinyayeke din, halê ewleda xwe fem fikir, texmîn fikir, wekî xwîna wê terecanê ser zarê dikele. "De bira zara wê bûya, wê çi bûya? -xwe bi xwe fikirî, -hela ciwan-ciwan bê miraz ma ... " Ewê nifirî qedera xwe, qîzê kir û rabû nivîn danîn. Dê û qîzê alîkarî dane hev, pêçeka zarê guhastin, şîv danê, razandin, xwe bi xwe jî ker û lal, bê şîv serê xwe danîn razan, bi wê gumanê, wekî siba bê, xêr û silametî jî pêra.

Di pey sur û serma, bagera duh ewrê berfê yê çîleqerqas ji hev bela bûbûn, bûbû çîk-sayî. Bîhna bayê

bakûrê yî sar dihat, qey tu dibêjî dikete nava hestuyê meriya. Ûsiv temamiya şevê hespên xwe têr kiribû, teng û ber, gem û hevsarê wan ên kapokkirî hazir danîbû, wekî hela hê tavê nedayî, li ber derê Karê bisekine. Rast e, westiyayî û kesirî bû, lê ji şabûna xew nedikete çavan ... Wî qirar dabû kû di rê de serê giliyan veke, derheqê xwestin û derdê dilê xwe, ji Karê re bêje.

Gewrayî nû ketibû sibê, wî hesp li xizekê girêdan, gîhayê kudeyî nerm tije xizekê kir, kulavek ji malê hanî li ser gîhê raxist, apinciyê serokê kolxozê yî reş û kurkê ji postê pêz çêkirî danî ser û bi rê ket ...

Di rê de fikran rê nedidane hev. Nizanibû yê xeber-  
27

dana xwe ya bi Karê re, ji çî dest pê bike. Gelo wê çawa qebûl bike, wextê hîvî û meremên dilê xwe bêje, ne axir heta niha ew bi tehrekî din nêzîkî wê dibû. Lê niha?. Wî çaxî wê bêje: Ew sax be jî bona min e, mirîbe jî bona erdê ye!

Wextê xizeka wî gihîşte perê gund, wî rişma hespan kişand, peya bû, zengilê hespan havîte stukura wan; wî mexsûs zengil bi hespan ve nekiribû, wekî di gund de kes pê nehese kû ew kuda diçe.

Karê, ku temamiya şevê di nav nivînan de xew neketibû çavan, sibê zû rabûbû, karên xwe yên çûyinê dikir. Diya wê û Saşayê biçûk hê razayîbûn. Hişê wê de fikra rê nedidane hev, yekê ya dinê înkâr dikir. Lê di pirsekê de wê qirara xwe dabû: Wê Saşayê biçûk bo

xwe xweyî bike, mezin bike!..

Wextê dengê zengilên hespên Êsiv hate bihîstin, Karê hahanga kincê xwe yên germ li xwe kir, bi ser pêçeka Saşa de mêl bû, sûretê wî yî di xewê de sorbûyî ramûsa û vegeriya ser dê:

- Inê, guh nede xeberdana xelkê, kî çî dixwaze bira bêje! Qey qedera min de weha nivîsiye ... Emê Saşa ji xwe re mezin bikin, dibe kû ew dewsa xemên min û te tijî bike. De ma xatirê te, dayê, -wê dê hemêz kir, hate rûyê wê, - ezê ji vir ha ve zû-zû ser te de bêm, çî lazime ezê bi xwe re bînim!.. -Karê got û derket der. Êsiv hazir hîviya wê sekinîbû. Karê li ser kulavê ser gîhayê nerm rûnişt, piştî xwe kuta piştîka xizekê, lê Êsiv apinciyê germ havîte ser navmîla wê, bi xwe jî li rex wê rûnişt û ajot. Xêlekê herdu jî kerr bûn, ne Karê, ne jî Êsiv nizanibûn ji çî dest pê bikin. Hulm-gulma firnikên hespan û xûdana wan wê siba çîke-sayî teyê bigota ji sîtila li ser agir dikişiya.

28

- Birê Êsiv, -Karê hêdîka got, -tuyê serma bikî, bikeve bin apincî. Êsiv, kû ne li hîviya vê gotinê bû, ruhdarbûyî di kêleka Karê de bi cî bû û li aliyê apincî yî vala havîte ser xwe. Karê, kû nihêrî apincî çawa lazime Êsiv nanixême, bêtir nêzîkî vî bû. Êsiv kurkê ser xizekê havîte ser lingên xwe û Karê. Dizgîna hespan sist berda, wekî ew hêdî, bi hemdê xwe herin, kû ew wexta ji bo wî giranbiha, dirêj bikişîne. Wexte ew bi rex hev rûniştin, alaveke germ herdu ciwana hilgeriya.

Karê dixwest hewekî xwe ji dûrî wî bigre, lê qewateke nediyar ew bend dikir. Wê herdu destên xwe yê bêlepik kiribûn nava lingên xwe, da ku serma negire. Ûsiv bi destê rastê bi dizgîna hespan girtibû, lê destê xwe yî çepê kire bin kurko Bêyî hemdê wî destê wî çû ser gîtka Karê. Wê xwest, destê wî wêda bike, lê Ûsiv bi destê wê yê germ girt. Wê kir destê xwe bikişîne, lê bi xwe jî, nikaribû çima, germaya destê Ûsiv lê xweş hat û paş de nekişand. Alaveke şirîn ber-bistanê wê hilgeriya û bere-bere hilkişiya jorê, ber bi sûret û lêvên wê... Wê demê qey dibêjî damarên herduyan gihîştine hev û xûna wan tevhev bû ...

Karê demeke weha şirîn cara pêşî di hemêza Cemalê destgirtiyê xwe de dîtibû û demekê wê weha dizanibû kû destê Cemal e, tenê destên Cemal mîna hevirmiş nerm bûn, lê ev dest zivir û hişk bûn ...

- Karê, hêviyeke min ji te heye, -Ûsiv destê Karê berneda, gotê.

Karê kerr vegeriya, li çavên wî nihêrî. Ûsiv ji rengê wê texmîn kir, wekî ew dixwaze bizanibe hîvîkirina wî çýye.

- Ji vir ha, îdî ji min re nebêje bira ... Karê, kû qey bêjî ji vê dinê biryabû û bê hemdê xwe, xwe sipartibû Ûsiv, 29

di ber xwe de got:

- Kes ji we bira nekeve halê min, hûn gişk jî bêînsafin ... Kê-kê, lê tu qet na, seba xatirê CemaL. -Wê gilyê xwe kuta nekir, kesera kûr rahîşt û xwe negirt,

kela girî hat, di gewriyê hasê bû... Ûsiv destê xwe bir bin çenga wê, berê wê ber bi xwe kir. Çavên Karê yên reş tije hêsir bûn. Wê bi destmalê çavên xwe zuha kirin, destê Ûsiv da alîkî û herduwa kerr li çavên hev nihêrîn.

- Karê!..

Karê bi tamamî teslîmî Ûsiv bûbû, xwe sipartibû wî û bi wê dihat kû wê demê mîna kevotkeke buhurtî di hewê de perwaz dide. Ûsiv destê xwe bi hustiyê wê re biribû, bîhna wê terecaniyê xweş hildikişand. Paşê lêvên wan ên ji sura zivistanê hinekî terikî û zivir' gihîştine hev. Hespan, kû wedekî dirêj dengê xwediyê xwe ne bihîstibûn, di nava rê de sekinîbûn, mîna ku nedixwestin evîna herdu ciwanan betal bikin. Karê weke karxezala beyanî ji nişkê ve silikî û ji hemêza Ûsiv derket.

- Ûsiv, tu çima wisa dikî, çima derdê min hê giran dikî, ne tu hevalê Cemalî herî hezkirî bûyî?.. Çima bênamûsiyê tînî rûyê min? .. Ne axir ez jî merî me, çima ji min venagerin ... Lê, wekî yek me bibîne? ..

- Bibaxşîne, Karê, min nedixwest dilê te biêşînim, hemû tişt bêhemdî min bû ... -Wî got, apincî havîte ser Karê û hesp qamçî kirin. Xêleke xurt Karê kerr bû, dilê wê dikuta, ji bo kirina xwe, xwe gunekar dikir. Lê wê berê-berê de di nav xortên gund de, gişkan pirtir qedrê Ûsiv digirt. Hela berî çûyina Cemal ya eskeriyê, wê wexta xeberdanekê, fikra xwe di derheqê xortên gund de ji Cemal re gotibû û Cemal kêfxweş bûbû,



wekî destgirtiya wî wisa kûr û dûr difikire, meriyan rind nasdike û rast bi qîmet dike, bedewiya meriyan di nav ruhên wan, di xeysetê wan de dibîne. Cemal wî çaxî bi henek ji Karê re gotibû: "Tu jî reş î, lê xweş î. " Ew ji vê gotinê nexeyîdîbû, lê bersiva Cemal weha dabû: "Ez ne reş im, lê dîsa xweş im." Paşê, waxtê wan xortên gund yek bi hemberî yê mayîn kiribûn, Karê fikra Cemal di derheqê Mecîd û Êsiv de qebûl nekiribû. "Tu sûretê Mecîd yê mîna keçika sor û kincên wî yên modnî dinhêrî?. Ew tiştên xapînok in... Tevayiya dinyakê dikare di dil û ruhê Êsiv de bi cî bibe Lê bejn û bala wî, xeberdana wî ya baqil û sirafetê wî A, evanane, bedewtiyê û şuretê didine meriyan. Cemal bi fikra Karê kêfxweş bûbû û bi laqirdî jê pirsîbû: "Lê te ji bo çî ji min hez kir?" "Tu him bi xisyetê xwe ve bedew î, him jî bi bejn û bala xwe ve. Xwedê kêma cara du xwezila dide yekî. Di vê pirsê de bextê min lêxistiye", wê bersiva Cemal dabû.

- Êsiv, ji min nexeyide, -wê serê xwe ji bin apincî derxist, gote Êsiv. - We qedera min a reş xwe re kiriye mane û dixwazin qerfê xwe bi min bikin, bi nav û namûsa min bilîzin ... Bikeve bin apincî, tuyê serma bikî -Karê kû dît ew wê hişkiyê ji bin apincî derketiye, dizgîna hespan sist berdaye û ketiye mitalên kûr, bi xemxurî gotê. Êsiv vejeriya, wê nihêrî, bi curê xeyd gotê:

- Karê, tu çima timê dibêjî hûn, hûn, pirane xeberdidî?

- Karê cî vekir, ew dîsa kete bin apincî, - bi fikra te re çawa derbaz dibe, wekî ez dixwezim bi nav û hurmeta te re bilîzim, tu çawa cesaret dikî tişteki wisa ji min re bêjî? Çima ez ewqas bêfem im? Min û Cemal mîna bira ji hevdu hez dikir. Lê bextê wî nclyanî, qey 31

qedera wî jî wisa bû? Ez ji te venaşêrim, Karê, wextê Cemal tu xwesê û hanî gund, ez ji vir û mala Xwedê şa bûm, wekî wî ji bona xwe hevaleyê jiyanê baş jibartiye. Ji te re rast bêjim, min bi sidqê qenc, bêqelpî di dilê xwe de xwezilaya xwe bi Cemal hanî, lê tu cara tiştên xirab neketiye dilê min. Eger tişteki wisa hebûya, te ê texmîn nekira, rast bêje ... Pey vê xebera nebixêr, wextê ev fikra hate serê min, wedekî dirêj ez mîna sewdasera bûbûm, min cesaret nedikir bi raste rast li çavên te binhêrim. Bi kurê, rastiya jiyanê, hesîna dilê min î gurr ez mecbûr kirim dilê xwe li ber te vekim. Rastî eve, Karê, dixwazî bawer bikî, dixwazî na!.. Eger tu niha min naxwaze jî ez ji te naxeyidim ... Pişê yekî mîna Cemal! ...

Wextê vê xeberdanê Karê dîsa xwe sipartibû. Êsiv û dengê dilê wî rind dibihîst, wê zanibû ev xeber hema rast ji wî dilî tîn, digihîjîne wê. Ew demeke şirîn û xweş bû ji bo Karê. Pey derd û kulên giran wê dema kurt azayî dabû hesînên wê yên ciwantiyê û ker-lal guhdariya Êsiv dikir. Êsiv bi dilovaniyê, milekî xwe di stuyê wê re biribû û serê wê bi sîngê xwe ve givaştibû. Nişkê ve dengê kûçikan hat - Êsiv û Karê serê xwe ji

bin apincî derxistin, dîtin, wekî hespan ew hanînegîhandine  
pêş gund- Karê mîna xezala beyanî ji ser  
xizekê çingkir-bazda erdê, berê xwe da gund, bi lez çû  
û pêra jî Ûsiv re got:

- Ez kû gihîştme gund, paşê li pey min were, ez  
por kurê bûme sosret,- got û lezand. Bedena wê berebere  
di nav dûmana hişk iya sibê de winda dibû, Ûsiv ji  
xizekê peya bû, cilê hespan havîte ser, xurome gîha  
havîte ber wan û ker li pey rêça Karê nihêrî. Lê-lêbû  
bida pey, vegeerîne, fikrên li tevhev rê nedidan kû rast  
32

bifikire. Şa bû, wekî Karê giliyên wî teksîr nake, lê bi  
xwe jî rind zanibû, wekî ji bo Karê halekî gelekî bi  
zehmet qewimiye, kû nikare jê derê. Lê ew zara kû  
hanî ba diya xwe? .. Ji bo Ûsiv ew jî tiştê nediyar bû.  
Wî li aliyê gund dinihêrî...

\* \* 2'r

Almasta diya Ûsiv zû ve texmîn kiribû, kû kurê wê  
hatiye guhastinê, kêm xeber dide, mîna berê nîne, niha  
her gelekî li bejn û bala xwe dinihêre, ji ber neynikê bi  
dûr nakeve, dixwaze qeşeng û bedew be. Almast di  
dilê xwe de şa dibû, wekî heye-tune Ûsivê wî çav berdaye  
qîzekê, lê ew kî ye, jê re ne eyan bû û rê û firset lê  
digeriya kû jê bipirse. Ya kurt, serê pirsê wî<avebû. Dê  
jê pirs dike, Ûsiv jî ji wê venaşêre û jê re hemû tiştî  
dibêje. - Yadê, min ê zû-dereng ji te re bigota, -ew  
dibêje,- niha ez dixwazim bizanibim, ka fikra te çiyê di  
derheqê vê pirsê de? Şika Almastê diçû ser hemû qîz û

bûkên gund, lê tu cara şik nedikir ji bo Karê. Wê kû ev yeka bihîst, demekê ji guhên xwe bawer nekir.

- Kara destgirti ya Cemal? ..

- Erê, dayê, ne tu bi xwe zanî, kaxeza Cemal ya reş zû ve hatiye. Paşê qîzên mîna Karê! ..

- Qusûra Karê tune, Ûsiv, ez zanim, -dê ber giliyê kur de tê, lê xelk, der û cînarên me wê çi bêjin? .. Lê Karê? Te qet jê pirsî, ew qayil dibe an na?

- Qayîl nebe jî, yek e, ez ê birevînim, -Ûsiv bi henek dibêje û dest stuyê dê re dibe.

- Ez qurban, Ûsiv, tiştên wisa neke, Karê destgirtiye, paşê ji bo me, nav û hurmeta me nepak e, -dê nizanî ji şabûnê, nizanî ji xofa revandinê bi tehrekî tevhev dibe,

33

şîreta didê. Ûsiv jî di bin bêfila xwe de dikene.

- Lê tu bawer dikî, wekî ez ê tişteki wisa bikim, dayê? Heta kû razîbûna Karê tunebe, dibe?

\*\*\*

Axlêve bû. Pencê tavê nû avîtibûn li serê çiyayên bilind. Tebiyet, jiyan hişyar dibûn. Ûsiv hespên xwe yên têrxwarî destkêş hanîbûn ser kaniya ber avayê êtîmxanê, av dida. Wî zanibû, kû di wê saetê Karê ji malê diçe êtîmxanê an jî ji êtîm xanê diçe malê. Hespan tîr av vexwaribûn, sekinîbûn, lê Ûsiv Karê nedidît. Wî hertim hespên xwe dihanîn ser vê kaniyê û caran rastî Karê dihat, pê re xeberdida.

Karê, waxtê dinhêrî dor-bera kesek nêzîk tune, disekinî, silava Ûsiv vedigirt, bersiva pirs-pirsiyarê wî dida

û dîsa bi lez diçû. Vê carê, waxtê wê texmîn kir, kû  
Ûsiv hîviya wê sekiniye, lê wê nabîne, qestbenda nêzîk  
çû, wekî Ûsiv wê bibîne.

- Siba te bi xêr, Karê, -Ûsiv waxtê Karê dît, silav  
dayê. -Tu xwe ne bi lez bî, ez dixwazim bi te re xeber  
bidim, lê nizam kingê û li ku derê?

- Bêje, Ûsiv, çi dixwazî? -Karê, serî di ber de sekinîbû  
û di dilê xwe de texmîn dikir Ûsivê çi bêje.

- Hema li vir?

- Lê li kîderê?

- Ger ez bême malê, tê min qebûl bikî? Pirseke min a  
ferz heye, ez ji te re bêjim.

Karê demekê fikirî, bersiva wî neda, bi lez çû xebatê.  
Dilê wê dikuta, sûret lê sor bûbû. Vîktoriyayê ew yek  
texmîn kir, li kêleka wê rûnişt fi gotê:

- Tu îro bi tehrekî dinê yî, Karê, çi bûye, çima dîsa tu  
34

tevhev bûyî? Dibe kû kurik nexweş ketiye? De wekî na,  
îdî çi difikirî? Çima em dikarin awqas zaran xweyî  
bikin, nikarin wî tifalî jî xweyî bikin? Ne axir Badalyan  
bi xwe ji te re gotiye kû wî bînî vira, an jî, eger naxwazî,  
wê hemû curê alîkariyê bidine te, wekî tu bikaribî wî  
mezin bikî. Hemû heval û hogirên te jî li ber te  
sekinîne, çima tu li ber xwe dikevî?.

- Na, Vîktoriya ji bo kurik îdî çi bifikirim, çi bûye  
bûye carekê. Qey di qedera min de weha hatiye  
nivîsandinê!.. -Karê got û bédeng ma.

- Çi ye, dibe kû dîsa wî Mecidî pêşiya te girtibe, tiştmişt

ji te re gotibe?. Karê, xwenga min, tu ya şîretan nînî, bi nû ve te şîret bikim. Tu bi xwe dikarî dinyakê şîret bikî. Xwe bi nû ve Cemal paş de venagerînî. Çima tenê Cemalê te çûye, venegeriyaye? Lê kanê bavên van zaran, kû niha em xweyî dikin. Şer e lê çi dibêjî? Tu rind zanî, ordiya me wê wan faşîstên dev bi xwîn îdî ji welêt radiqetîne. Lê ew bi saya çiyê? Bi saya xwîna hezaran Cemal an e... Bê wê yekê nabe. Dilê xwe fireh bigire, jiyana hê li pêşiya te ye! .. Ji xortên, kû çavên wan li te ne, bi fikra min, di nava giştan de, ez ji bo te yê herî hêja wî Ûsivî dibînim. Tu zanî, bi ya aqilê xwe bike!.

- Nizanim, Vîktoriya, ez ketime nava du keviraan!.. Karê êvarê dereng hat malê. Kesirî bû. Xebata rojekê ya giran û fikir-mitalê qedera wê ew ji hal xistibû. Xwest bikeve nava nivîna, rehet be, lê kete bîrê, wekî Ûsivê bê. Zû-zû mal da hev, sobe vexist, da ku tîn bikeve odê, (êvarên pêşî yên biharê sar bûn). Xêleke 35

xurt şûn de derê wê nerm kutan. Karê hahanga rabû. Zanibû Ûsiv e, lê sekinî, demekê fikirî: Dêrî lê veneke, bêje careka din bê, niha bêkêf e. Lê qey bêjî destekî nediyar ew ber bi derî def didan. Berê ewlîn li ber neynikê sekinî, li xwe nihêrî, porê xwe rast kir. Derî dîsa kutan. Wê nerm pirsî -kî ye? Ûsiv hêdî navê wê hilda. Karê kû derî vekir, ew bi lez hate hundir, derî li dû xwe girt.

- Ûsiv, min nedixwest derî li te vekim, lê..Jê nizanim

çima ... -Wê li çavên Ûsiv nihêrî.

- Karê, ew çi xişûşe di dilê te de, wekî wisa bi du diliyî. Çima ji min re rast nabêjî? Niha ez hatime, gere tu dilê xwe li ber min vekî. Eger naxwazî, ez ê paş de vegeyîm ...

Ûsiv nêzîk, pêşberî Karê sekinîbû, nizanibû çi bigota. Ûsiv destê xwe bir bin çena wê, serê Karê hilbirî û herduya li hevdu nihêrîn. Ûsiv bi herdu destan girkê milê Karê girt. Wê terecanê wa zanibû kû lingên wê ji erdê hatine birînê, di hewêdane: Wê serê xwe hêdî danî ser sîngê Ûsiv. Ûsiv bi hezkirin ew bi sîngê xwe ve givaşt. Ji kela dilê ciwantiyê ew qey bêjî ji vê dinya heq biryan, agir-alava dilê herdu ciwana tevhev bû, germayîke xweş di weynaxê wan hilgeriya û xwe bi xwe jî texmîn nedikirin çawa lêvên wan gîhîştine hev. Karê bi tamamî teslîmî Ûsiv bûbû û wî bi herdu destan navkêleka wê girtibû. Karê mîna kara xezala beyanî di hemêza wî de dipirpitî. Ji wê xazlaya cinetî Karê hê zûtir hişyar bû, tenê hêdî û bi hezkirin got:

- Ûsiv!!! .

Dema dinê ew ji hemêza Ûsiv derket, li ser kursiyê li ber text rûnişt, bi herdu destan bi serê xwe girt, xêlekê kerr bû, paşê rabû, kursiyê bin xwe da Ûsiv, bi xwe ser

36  
nivînê xwe rûnişt, got:

- Rûne!

Ûsiv rûnişt. Xêleke xurt herdu bêdeng rûniştibûn, nizanibûn ji çi dest pê bikin. Paşê, Ûsiv serê pirsan vekir:

- Karê! Ez hatime em tevayî qirar bidin ... Bi vî tehrî him ji bo min û him jî ji bo te dest nade. Qederê weha kiriye, milletê me weha dibêje, tu zanî. Tu kes ji ber qedera xwe nikare bireve. Çawa tê kifşê, qedera min û te bi hev re hatiye girêdanê. Kê zanibû wê weha bibe?

- Ez zanim, Êsiv, tu kes ji qedera xwe nareve. Lê vê gotina pêşiyên me jî bîr neke, siba xweş di sibê de xweş e. Ez porkurê di ber kîjan derdî de li ber xwe bidim. Hîviya min, di vê dinê de diya min a feqîr maye ... Kela dilê wê dîsa tije bû, xwest fikra xwe dûmayî bike, lê xeber di gewriyê de man. Êsiv di ber dilê wê de hat:

- Ezîza min, çima wisa dibêjî, lê ez?.. Wisane tu min xerîb hesab dikî... Xeber Êsiv jî biryan, wê demê nizanibû çî bigota, wekî kela dilê Karê dayne.

Karê zûtirê hate ser xwe. Mîna hertim rast fikirî.

- Êsiv, niha, di vî halê min î nepak de, waxtê derba jiyanê li min ketiye, yek lazime destê xwe dirêjî min bike ... Ez ji te, ji xemxuriya te dilxweş im... -Karê dixwest tiştê bigota, Êsiv giliyê wê birî:

- Ez qasî ruhê xwe ji te hez dikim, Karê, lê tu? .. -li gune-gunê çavên wê nihêrî. -Pirsekê bide min ...

- Êsiv, -Karê demeke xurt fikirî û bi hemdî xwe got, - Ez naxwazim ne te, ne jî xwe bi xwe bixapînim. Hezkirina Cemal wê di dilê min de bi min re here gorê ... Ji min nexeyîde, ne jî dixwazim dilê te biquşînim. Eger bêjim, wekî di pey Cemal, ez ê bikaribim ji yekî dinê hez bikim ... -Karê serê xwe bilind kir, li Êsiv nihêrî, kû li tevhevbûyî û bêsebir li hîviya bersiva wê bû. Karê



xwe hinekî kerr kir, paşê, dûmayî kir:

- Ez jî, Cemal jî timê li ser wê fikrê bûne, wekî di nav heval û hogirên wî de xortê herî baqil î baş tuyî.

Ûsiv, kû hîviyêbû, wekî pey hawqas nêzîkbûnê, Karê yê pirsar dawî bidê, wekî ewê jî mîna wî hezkirina xwe diyar bike, pey vê gotina Karê xêleke xurt kerr difikirî, qey bêjî pêla bayê sar hat, ser kela dilê wî re bihurî.

Paşê li ser gotinên Karê kûr fikirî, xwe bi xwe jî texmîn kir, ku gotinên wê bi heq in, hezkirina mîna ya wê û Cemal wisa zû nikare bitemire. Lê li rastiya jiyane dinhêre, zane, wekî pey tiştên çûyî nakevin. Bo kû ber dilê wî de bê, dibêje, wekî wê û Cemal di nav heval û hogiran de ew ecibandine. Ji vê gotina Karê tê kifşê, ku rast e ew ji wî heznake, lê qebûl dike kû jê re bibe hevala jiyane. Vê fikrê dilminî dida wî. Lê dilê wî ji vê gotina Karê birîndar bûbû, nedixwest xwe kêmbike. Ji wê re got:

- Ez nehatime ba te, ji bo recoyê, wekî gunê xwe bi min bînî ...

- Ûsiv, -Karê got û ji ciyê xwe rabû, ber bi wî çû, -ji min nexeyîde, tu hê min ji nêzîk ve rind nasnakî. Çi kû di dilê min de hebû, min ji te re rast got, lê dilê min ji min re dibêje, wekî xortê mîna te hêjayî hezkirinê ne...

-Karê got û bi dilovanî destê xwe danî ser serê Ûsiv, kû berjêr dinhêrî. Ew ji ciyê xwe rabû, çavên Karê yê bi aqil nihêrî û ew hemêz kir. Herdu demeke dirêj di nav odê de hemêza hev de bûn, ji ramûsanê têr nedibûn.

Paşê Karê ji hemêza wî derket, çû li ser nivînê xwe rûnişt û got:

- NAÝAve şeveA ye AýdAýÛ, ' sýv, here ,....

Ûsiv hat, li kêleka wê rûnişt, destekî xwe di stuyê wê re bir, destê dinê bir nav sîng û berê Karê. Karê bi 38

herdu destan destê Ûsiv girt, li çavên wî nihêrî, hêdîka got:

- Ûsiv, tu çi dikî?.

Demekê wê xwest kû nehêle Ûsiv nêzîkî wê bibe, paşê destên wê ber de hatin û azayî da destên Ûsiv. Xêleke xurt bi hev şa bûn, paşê Ûsiv hêdî got:

- Karê destûrê bide ez îşev li ba te bimînim ... Karê deng nekir, bi herdu destan çavên xwe girt, hêdî piştosan li ser nivînê xwe palda ...

Di derheqê vê yekê de, wekî Ûsiv û Karê qerar dane kû bi hev re bizewicin, mîna bayê birûskê di gund de belav bû. Piste-pista jin û bûkên gund bûn. Her yekê tiştê digot. Mêrên gund, bi dil li ser qerarê Ûsiv û Karê şa dibûn. Qedir û qîmetê Ûsiv di gund de rind bû. "Ka hemû xort mîna Ûsiv bibûna, -gundiyan ji hev re digotin, -waUe Ûsiv û Karê hêjayî hev in, Karê li ber çavên me mezin bûye, qîzên mîna wê kê in, nav û namûs, jîr û bi xîret û xebatkar ... Qedera wê feqîrê jî weha bû, çi karî bikî? ... " Qîz û jinên gund, li kêderê rastî hev dihatin, xeberdana wan ew bû.

"Dewat"a Karê û Ûsiv bê heytehol, di nav koma qewm û pismam, heval û hogiran, bi nav xwe de

derbaz bû. Serokê kolxoza gund hîvîkirina Ûsiv qebûl kiribû, pezeke kok dabû wî. Ûsiv jî ji nehiya cînar eraq û şeraba vekirî, hinek êmîşê ter hanîbû. Di mala Ûsiv de êvarekê berhev dibin, dixwin û vedixwin, wan

39  
herdu ciwanan pîroz dikin.

Wê êvarê gişk bi dil û eşq şa dibûn. Dîrektorê êtîmxanê Badalyan, qedeh rakir û got:

- Di van rojên ji bo welatê me yên bi zehmet de, em du bext û mirazê hêja digîhînine hev, -Karê, -Badalyan berbirî wê dibe, tu hêjayî wê yekê yî, wekî di derheqê te de bi pesin xeberdin ... Ev gotina xelkê Kurd, wekî şêr şêr e, çi jin e çi mêr e, ev gotina ji bo jinên mîna te ne ... Li vira jî şer e, min ê bigota şêrê hê mezin û tu bi xebata xwe, bi şuxulê xwe, bi nehêvşandina xwe didî kivşê, wekî şer tenê pêşê mêran nîne. Ev zarên em niha xweyî dikin û bê dê û bav mane, ji rûyê Almanya faşîst e, kû îro îdî dihedime ... Serketina me nêzîk e û rojên bextewar û xweş hîviya me ne. Keda we û ya bi deh hezaran yên mîna we di vê serketinê de pir e, ez ji bo te û Ûsiv ya here qenc dixwazim ...

Ji bextewariya merivan gelek tişt ne hewce ye, -Karê xwe bi xwe difikirî, -hezkirina di dilê dualî, wê hesab dikir kû ya here sereke ye, bo kû, bi dîtina wê, hemû kêmasî û bêbextî, yekbûn û belavbûn ji vê dest pê dike. Di pey daweta xwe ya biçûk, demeka xurt derbaz bûbû û çawa dibêjin ew û Ûsiv ketibûn kirasê hev, caran rûdinişt, difikirî: Ew çawa bû, wekî di pey

Cemal, wê tiştê wisa kir ... Xwe bi xwe jî bawer nedikir, wekî hezkirina kû wê ji Cemal hezdikir, dikare sar bibe û bê jibîrkirinê. Lê, çawa mezinan gotiye, pêl tên pêlan winda dikin.

Lê eger nişkê ve xebera di derheqê kuştina Cemal derew be û ew paş de bê? ... Difikirî û ji vê fikra xwe xof dikişand.

40

Mizgîniya kutabûna şêr, Ûsiv berê ewlîn Almasta dê û Karê re hanî. Ji şa bûnê hersêkan hevdu hemêz kiribûn û xêleke xurt hev bernedidan. Ji şabûnê çavên Almasta tije hêsir bûbûn, lê Karê li ser kursî ker-lal, pormijî rûniştibû. Destekî nediyar qey bêjî dilê wê digivaşt. Pêlên hesîna şabûnê û bîranînên rojên buhurî tevhev bûbûn, nizanibû rê bide kîjanê ... Hingê ew hatibû mala Ûsiv, cara ewlîn dilê wê wisa qusiya. Wê siba baharê ya xweş hêwarze li gund ketibû, giştan çav ronkayî didane hev. Xebatkarên gund, kû gere biçûna xebatê, di nav gund de berev bûbûn, bi eşq û şa hev pîroz dikirin. Jiyan qey bêjî ji riya xwe derketibû, eşq şabûn, hêwerze bû, nas-nenasa hev hemêz dikir, hema der ve, li serê rê û ber derê malên din textên xwarin û vexwarinê vedikirin ...

Çûyina Cemal û mektûbên wî şandî ketin bîra Karê ... Paşê ew êvara zivistanê ya sar, hatina wê jina ûris, Saşae biçûk hatin ber çavên wê... Kesera kûr rahişt. Ûsiv û dê ve ev yeka texmîn kirin.

- Karê, -Almast ber bi wê çû, - çi li te bû, dinya şa

dibe, tu keserê dikişînî?

- Tişt nabe, inka Almast, hema wisa, nizanim çima? .. -Xwe girt û çû xwe siparte Ûsiv, kû hewekî dûr û metelmayî li Karê dinhêrî. Ûsiv jî, Almasta diya wî jî pêra-pêra texmîn kiribûn kû çima kêfa Karê nişkê ve ket. Ûsiv ew bi milekî hemêz kir, ber dilê wê de hat:

- De pak-pak, ez zanim çima wisa ber xwe ketî. Ne, tu li dinyayê şîret dikî, ew tu mal hene kû du-sê mêr jê çûne û venegeriyane, çiqas-çiqas destgirtî, bûkên dest bi hine, çavên wan di riya hezkiriyên de qerimîne ... - Ûsiv demeke kurt li çavên wê nihêrî û bi curekî xeyd

41

gotê, -wisane tu ji min hez nakî, erê? ... Bû îskîniya Karê, xwe bi sîngê wê ve givaşt.

- Tu çiqasî kumreş î, Ûsiv, çima tu şikberî ji hezkirina min? Karê para ve lê nihêrî, dît Almasta dê derketiye der, dûmayî kir, -îdî çi bikim, çawa bêjim? .. Ne axir tu kû saetekê dereng têyî, ez nizanim çawa bikim ... Nexeyde Ûsiv, ne ez jî merîme, xwîn-goşt im. Ew rojên buhurî nişkê ve ketin bîra min, demekê dêrî bûm. Ûsiv Karê bi sîngê xwe ve givaşt. Ewî ji wê bawer dikir, zanibû, wekî xeysetê wê nîne derew xeber bide. Ûsiv xwest kû derkeve der.

- Ûsiv, kînora gîtka te wê derbûye, xwîn û kêr di delinga te re hatine xwarê, ha kuda diçî?

- Erê Karê, min ji bîr kiribû, ji te re bêjim. Wisane, wextê min xebera serketinê bihîst, ji şabûna cî quloz bûm û evê kînora, kû ez zêrandibûm, derbû.

Karê pêra-pêra av germ kir, birîna wî şûşt, dûderman  
kir û paşê hîşt ew ji malê derkeve .

.....

Kes nizane jiyan kê re û çawa li hev tê. Karê, li pey  
awqas derd û kulan, vê carê ji bextê xwe re şikir dikir,  
di pey Cemal yekî mîna Ûsiv rastî wê hatiye û jê hez  
dike.

Çend sala pêş de, berî destpêkirina şer, ew qîzika  
bêxem hew zanibû jiyan rêyeka raste dûze, wê xwe lê  
bigre û firêqet here, bigihîje mirazê xwe. Wî çaxî, rastî  
jî, her tişt bi wê re rind li hev hatibû: Xortekî mîna  
Cemal para wê ketibû, bêhed û hesab jê hez dikir û  
bawer nedikir, wekî quweteke wisa yê peydabe, kû bikaribe  
wê hezkirinê biqedîne. Wê zûtirkê dest bi

42

xwendina navîn bike, ew û Cemal yê maleka wisa bi  
tevayî çêkin, kû gişt havêjiya xwe bi wan bînin. Ewê kû  
zanibû, wekî her tiştên awha li tevîhevbe, wekî Cemalê  
tunebe, ewê vê carê dîsa bi xwestina qenc û dilê temîz  
ji yekî din hez bike û bihebîne. Çima awha bû, -wextê  
bi tenê dima xwe bi xwe difikirî, -Min bi kê xirabî  
kiribû, wekî awqas derd bi para min ketin? .. Lê Saşaê  
biçûk? .. Ew ji ku hat, çima qedera vî zarokê bêşûc bi  
qedera min bextreşê re hate girêdanê? Gelo ev yek bi  
xeAr e an şer e;.l...

Dema dinê Karê xwe bi xwe dilminî dida xwe. Evî  
şerî çiqas-çiqas mal wêran kirin, çiqas-çiqas jiyan temirandin,  
çiqas-çiqas miraz qurçimandin ... " Evda kû li

ber derdên giran disekine, -Karê difikirî, -zeman birînên dilan, yên herî xeder jî melhem dike ... "

Hingê ew û Êsiv bi hev re zewicîbûn, di jiyana wê de guhastina mezin bûbû. Êsiv bi hezkirina xwe, bi qedir girtin û guhdariya xwe hemû xemên wê belakiribû. Ew mîna berê îdî dereng nedihat. Bi ku de jî dişandin, zû vedigeriya, zanibû, wekî Karê bêsebir li hîviya wî ye. Ewî bi xwe jî bê Karê rihet nedikir. Almasta dê ji Êsiv zeftir ji Karê hezdkir, pariyê herî xweş dida wê. Karê haqa ruhdar bûbû, wekî kû wê qet derd-kulê giran nedîtiye, caran Saşaê biçûk û Perîşana dê jî nedihatine bîrê. Êsiv timê serê pirsê vedikir:

- Emê zarên xwe bi tev Saşa mezin bikin, hesêbanî ew nuxuriyê meye. Eger Perîşana diya te jî qebûl bike, bira bê, emê bi tevayî bijîn, kî min heye, ez im, tu yî û diya min e? Wê demê tenê per-baskê Karê tunebûn kû bifire. Ewê Êsiv hemêz dikir û wedekî dirêj bernedida, ne wê, ne jî Êsiv texmîn nedikirin, wekî jiyan ji bo wan derbeke xedere din jî hazir dike.

43

Bihara sala kutabûna şer û serketinê, ji biharên salên derbaz bûyî cure bû: Roj tunebû kû baran nehata çiyar û baniyan, gelî û geboz, çayirên dora gund bi hemû awazên tebiyetê xemilî bûn. Ji hemû tiştî dihate kivşê, ev sala yê xweş here, zeviyên rind bin. Warguhastin ketibû gund: Bawer bikî hefte tunebû kû eskerên birîndar, an jî sax-silamet venegeriyana malên xwe. Rojê di mala yekî de eşq û şayî bû.

Wê siba biharêye ewrayî, Ûsiv dîsa zû ji malê derket.  
Derketinê wî ji Karê pirsî -eger diçe mala diya xwe, teseliya  
wê û Saşa bike, wê kingê vegere, kû ew bê pey  
wê. Karê ji Ûsiv re got, wekî wê ji Badalyan hîvî bike bi  
otomobîla êtîmxanê here û vegere, ji ber kû ew bi xwe  
jî gelekî mijûl e, wext tune peya anjî bi firxûnê herebê.  
Nîvro şûndabû, gurîniya ewr û ezmana, nîşan dida,  
wekî baranê bibare. Taviya biharê hat di ser gund re  
derbaz bû. Xêleke xurt barî erdê pê re nedigîhand kû  
avê hilçîne xwe. Av û heriyê mecal nedidan ji malekê  
herî mala din ...

...Tarî îdî ketibû erdê, gava Ûsiv vegeriya malê. Karê  
û Perîşana dê texmîn kirin, wekî ewî mede kiriye, kêfa  
wî mîna hercar ne bi ciye. Xof kete herdu jinan; ew ne  
ji Ûsive, ese tiştêk lê bûye. Karê nizanibû çima, cesaret  
nekir jê bipirse, çi bûye, lê dilê wê texmîn dikir, wekî  
kû tiştêk bûye. Dê jê pirsî:

- Ez qurban, Ûsiv, çi bûye, çima wisa mede kiriyî?

Ûsiv bersiva diya xwe neda, lê wexta kû dît Karê  
bêsebir û metelmayî li wî dinhêre, ber dilên wan de

44

hat:

- Çima wisa li tevhev bûne, tu tişt nebûye ... Dê pêrapêra  
sapokên lingên wî kişandin, Karê jî teşt û av hanî,  
wekî lingên wî bişo, Ûsiv lingên xwe kirin nava avê,  
serê xwe bilind kir, dê û Karê nihêrî, got:

- Hespeke min mir ... Heyfa wê mihînê, hespa mîna  
wê tunebûn ... Dê û Karê ber dilê wî de hatin.



- Dê qurbana te be, çî derd tê hema bira li serê hespan be, ber xwe nekeve, lawo, çima hespên kolxozê îdî tunin? Ji bo wan hêsabû wisa bêjin, lê Êsivê pistor û karker te digot bê Nîgarê (navê mihîne awa bû) îdî nikare bixebite. Nizanibû çima dilê wî tirs digirt û di mirina Nîgarê de tiştêkî bêxêr didît. Ji bo mirina mihîne wî wisa zanibû kû ew gunekar e. Waxtê vê bihara gur ew ji deştê vedigeriya, serê hespên têrxwarî berdabû, heta bêderên kolxozê ew çargavî ajotibûn. Nîv saetê şûn de xeberê didine Êsiv, wekî kû mihîna wî werimiye. Doxtirê kolxozê û Xudoyê şêx kû ji nexweşiyên heywanan femdikir, dikin-nakin çare lê nabe, mihîn saetekê şûn de dimire. Bi texmîna Avdelê doxtir mihîn jerdadayî bûbû, lê bi texmîna Şêx Xudo mihîne banzdaye. Bi a şilovekirina wî, rûvî yê wê bi hevpiçikîne ...

Tu tişt nikare riya kevirê kû çiyê tot xwe dibe, biguhêze. Bela kû tê, kes nizane ji ku tê û çawa tê. Pey vê yekê, roj tira duda serokê kolxozê gazî Êsiv dike, dibêje, wekî ji nav hespên kolxozê kîjanî dixwaze bira bibijêre û girêde, bona kû ew vala nesekine.

- Eger te nav hespên girêdanê de yeka çê nedît, ez  
45

destûrê didim, Çûrê girêde. Çûrê mihîna serok bû kû ew rimê pê wê digeriya.

Êsivê pistor hemû hespên gund rind nas dikir û zanibû, eger Çûrê hînî girêdanê bibe, wê dewsa Nîgarê bigre ...

Mîhîna serok ew heftek-dudu bû kû xamtî dikir,  
dereng hînî gem û hevsarê girêdanê dibû. Ûsiv rimê bi  
zehmet ew xamût dikir û girêdida; disilikî, gez dikir,  
refes dihavîtin. Ewê heywanê serbixur wê rojê qey bêjî  
bi zanebûn nesilikîbû, bêdeng sekinîbû, heta Ûsiv  
xamût dike hustû. Dixwaze teng-berê wê para ve  
bişidîne, hema wê çaxê disilike û bi herdu lingên paş ve  
li defa sîngê Ûsiv dixê. Ûsiv li ser piştê dikeve, texmîn  
dike, wekî alava germ di zikê wî hilgeriya. Pêra-pêra  
radibe qamçî hildide û mihînê dikute, lê paşê îdî nayê  
bîrê çawa lawikên li wir wî hildidin, dibin dîspansera  
piçûk a gund.

Memûrê sihetêyî ceribandî Samsonê kal, pêra-pêra  
dibêje, wekî Ûsiv zû bigihînine nexweşxana merkezê,  
nehiyê.

Gund-gundîtî derê dîspanserê berhev dibin, her yekî  
tiştê digot. Almastê û Karê, waxtê vê xebera bêxêr  
dibihên, şuxul-emelê xwe nîvcî dihêlin, dilezînin  
dîspanserê. Almast mîna sewdesera lûbe-lûba wê bû,  
li çokên xwe dixist, porê serê xwe vedirût, lê Karê  
reng lê çûbû, xeberdan lê nedibû, tenê sîngê wê zû-zû  
hildikişiya, dadikişiya. Du karkerên êtîmxanê ketibûn  
bin milên wê.

Waxtê kû ew hate hundirê dîspanserê, Samson û  
hemşîrekê milê Almasta dê girrin, ji Ûsiv dûrxistin, lê  
Karê ker-lal li kêleka wî rûnişt, rind mêze kir, paşê  
hêdî ji wî pirsî:

- Ûsiv, hespê li kêdera te xist? Ûsiv bêrengbû û lêv lê zûha bûbûn, çavên xwe bi zehmet vedikir, li Karê nihêrî, destê xwe danî ser zikê xwe û Îdî xeberdan pê nebû, çavên xwe dîsa girt.

Hewar-hêwerza Almasta dê dîspanser hildabû, lê Karê lap miçiqîbû, bi zehmet xwe digirt. Samson kû dît Karê jî nebaşê, emir da kû avê bidinê. Wê demê xeber dane Samson, wekî dîrektorê êtîmxanê otomobîl şandiyê kû Ûsiv cîguhastî nexwaşxana nehiyê bikin. Pêva Karê li ber serê Ûsiv rûniştibû, bi herdu destan serê wî girtibû, kerr-lal di dilê xwe de dişewitî. Du caran pêwîst bûn kû bisekinin; xwe ve diçû, çav lê diqulipîn ... Hemşîrê herdu caran jî derzî li wî xist, heta gihîştine cî.

Operatorên nexwaşxanê hemû tiştî dikin, wekî jiyana Ûsiv xilas bikin, lê çare lê nabe - Ûsiv berbangê dimre. Wê şevê Karê ji ber serê Ûsiv ranebûbû. Lê Almasta dê, pey gotina doxtiran, wekî kû hîvî kemê, vedigere malê, dest bi şîna giran dike.

Gund-gundîtiyê şîna Ûsiv dikin. Piçûk û mezin digiriyan, dikewgirîn. Jinên dengbêj digotin-dilûbandin, dihavîtin ser wan mêr û xortên gund kû di şer de hatibûn kuştinê. Şiklên wan bi rêz danibûn fêza meytê Ûsiv, digiriyan, gişk bi xwe re didane giriyandin. Karê û Almastê serî heta piya reş li xwe kiribûn. Herduyan jî hîvî ji Perîşanê dikir, wekî kû bistirê, bilûbîne, bavêje ser Ûsivê wan, ew hêjayî wê yekê ye. Perîşanê bi dilşewat digot, paşê bi dor, mêrên gund distirand û

dihavîtine ser Ûsiv û miriyên gund, dawiyê de giştan bi  
47

hev re digot: "Birawo!.. Birawo!"

Karê, kû tu cara di jiyana xwe de nesitrabû, bi dengê  
xweyî zirav wextê kû digot heylo wayê, kesekî nikaribû  
xwe bigre.

"Heylo wayê, heylo wayê,

Heylo wayê, heylo wayê

Gelo çima kula wan xorta tûre

Ji dilê min rebenê dernayê ... "

Giştan zanibû, wekî ew xortên tûre Cemal û Ûsiv in  
kû bextê Karêyî reş re nebûne para wê. Hespera Ûsiva bi  
serê xwe yek mayî zîn bûsatkirî li ber derê wan  
girêdabûn, kincên Ûsiv havîtibûne ser û wextê ji  
gundên cînar hewarî dihatin, kotel diçû pêşiya wan,  
mêran distiran û bi hev re dikirin, "birawo!..."

Salên dirêj derbas dibin. Rewşa gundê Mêrgesorê  
hatiye guhastinê. Hukumatê û daîrên cure bi cure mal  
û xaniyên nû çêkirine. Hemû tişt bi tevayî hatine guhastinê,  
ciwanên gund pir bûne, dixwînin, bi jiyaneke  
nû dijîn û dixebitin. Di ew êtîmxana gunda wextekê  
de, kêman kes mane. Zarên bê dê û bav mezin bûne, ber  
firê ketine, bûne pêşekzanên cur bi cur, di gund û bajaran  
de dixebitin, lê Mêrgesorê ji bîr nakin; salê carekê  
têne wergê bîraniyên zarotiya xwe, li ba heval-hogir,  
dersdar û terbiyetdarên xwe, ji wan hinek hela hê dixebitin.  
Ji wan yek jî Karê ye.

Karê jî ne mîna Kara berê ye. Çavên wê yên bedew û

baqil dîsa mîna yê berê ne, lê bejn û bala wê ya xweşik  
48

ji bedewiya xwe ya ciwantiyê ketiye, ew her tijî û giran  
bûye. Ji rûyê wê, ew rojên bi zehmet û derd ûkulan tê  
xuyanê. Merivên nenas jî dikarin vê yekê texmîn bikin.  
Porên wê yê kurûşke, bedew weşyaye û qey bêjî qirava  
payîza dereng xwe havîtiyê. Ew porên kû sipî bûne  
bedewîke taybetî didine demê wê.

Salên jiyana ciwantiya vê jinê mîna ava baharê ye hûr  
û gur hatin-buhurîn û tiştê li pey xwe nehîştin, lê niha  
rasterê bûne û bi hemdê xwe nerm dikişin. Yek cara,  
waxtê kû bi kendal û kevira hasê dibin, dîsa dikine  
xuşîn û wîşîn, pêş de diçin.

Jiyan, rast e derd û kula dide meriyan, lê wana bê  
guman nake. Gumana dilê meriya ji vê yekê serî hildide  
û meriv li ber derd û kulan bi sebir dibe. Guman  
xwîşka xem û xeyalê meriyaye.

Di pey mirina Êsiv, Perîşana diya Karê, Saşa hildide  
tê ba Karê û Almastê. Ew demekê şûnde nexweşîka  
giran dikeve. Nexweşxane û doxtiran nikaribûn wê ji  
kula xeder xilas bikin. Karê ew derba jiyânê jî wek yê  
dinê qebûl kir.

Saşa îdî mezinbû, li ber dilê Karê bûbû stûn, gumana  
mezin. Ew bi aqil û kemal bû, di dibistanê de xwandewarê  
herî hezkirî bû. Him li gundê malbavanê Karê -  
Çîmanê de- , him li vir -Mêrgesorê de- gund-gundîtî bi  
serê wî sond dixwarin. Ew mîna mezina difikirî û xeberdida,  
qey bêjî ji salên jiyana xwe zûtir digihîşt. Di

herdu gundan de zanibûn ew kî ye. Pesnê Karê, rehma dilê wê, kirina wêye qenc didan.

Lê timê şikek di dilê Karê de dijiya. Ew difikirî: "Lê wekî Saşa pê hesiya ew kiye, wê çi bersiva wî bide, ewê çawa vê yekê qebûl bike û eger bixwaze here, wê çawa pey wî re bijî, ne axir vê dinê de tarq-farqa wê yek tenê 49

ew maye? .. "

... Saşa sinifa deha bi başî xilaz kir. Roja kû wî şadetnama xwe hanî malê, dê û Almasta pîr ew hemêz kirin bi dilê şa ew pîroz kirin.

Karê demekê bejn-bala Saşaya bilind, porê wiyî bi rengê genimê sor, tûncika wî ya li ser eniyê de hatî nihêrî, pê re kêfxweş bû, dilê wê lê-lêbû ji qefesê derê, bifire. Rabû bi ber ve wî çû, ew hemêz kir, sûretê wî ramûsa, serê xwe da ser sîngê wî, ew bi xwe ve givaşt û ji kela dil giriya. Kur ev yek texmîn kir, serê dê bilind kir, li çavên wê nihêrî û metelmayî jê pirsî:

- Dayê, çima tu digrî? Dewsa ku tu şabî! Gelo tişteki bû, bêje?

- Na ezîzê min, wê çi bibe? Ez ji şabûnê digrîm. Şikir ji vê gavê re, tu îdî gîhîştî!..

Almastê karê xwe dikir, xwarina xweş û cur bi cur çêkir, kade dipet, lê Karê jî ji qutiya kincên xwe tişteki pêçiyayî piçûk derxist û vekir, gustîla kû Seyrana diya Cemal dabûyê bona nîşaniya wan, hilda demeke kurt vî alî-wî alî lê nihêrî: - Hela ware cem min, îskenderê min, ezê ji te re tişteki bêjim, wê gazî Saşa kir. Saşa bi

lez hate ba dê, li kêlekê rûnişt, dîsa metelmayî lê nihêrî.

Hela hê di gundê Çîmenê de waxtê Saşa di sinifa pêncê de dixwend, rojekê ji dibistanê tê malê û şa-şa ji pîrka xwe Perîşanê re dibêje:

- Pîrkê, tu zanî navê min çiye?

Perîşan vedigere wî hemêz dike, rûyê wî maç dike û dibêje:

- Tu niha birçiyî kurê min, ware rûne, binhêre pîrkê ji te re çi çêkiriye, -toê miya û hingiv dide ber wî, - çiye, çima te navê xwe ji bîr kiriye kû tu ji min pirs dikî?

50

- Na pîrkê, mamosta min -Anna îvanovnayê, îro ji min re got, wekî navê minî rastî Aleksandire, ji bo kû piçûk im ji min re dibêjin Saşa, erê pîrkê, rast e? Perîşan kû guhastina navên ûrisî nizaibû, ji vê yekê şik diçe dilê wê, bi ser re derbaz dibe, bersiva rast nade Saşa, dihêle kû heta Karê tê, jê pirs bike, ka ew çi bûyer e?

Karê kû tê, evê yekê ji dê dibihîse, pê re şilovedike, wekî rast e, navê ûrisî yek caran têne guhastin, wekî Saşa bi rastî Aleksandir e, lê Aleksandir bi Kurmancî îskender e. Ew nava bi Perîşanê gelekî xweş tê û ji wê şûn de ew, him jî heval-hogirên wî, îskender hi îsko gazî dikan.

- Dayê çi bûye?

- Îsko, ron aya çevê min, îro rojeke bi nav û nîşan e di jiyana te de. Eva jî pêşkêş he ji aliyê min, ji te re, -Karê

dibêje û gustîlê dike tiliya Saşa. - Eva nîşaniya bavê te bû kû miraz pê nekir. Ez dixwazim bi vê gustîlê qîzeke tu jê hezbikî nîşan bikim. Ka binhêrim tê hez bikî? Qîzên rind di gund de hene, te qe kesek daye ber çavên xwe? - Dê bi ken got.

- Na, dayê, -Saşa soro-moro bû, dê hemêz kir, - wextê hez bikim ez ji te venaşêrim. Ji bo pêşkêşa te jî gelekî sipas dayê can!

- îsko, îsko, -hema wê demê Almast, dîkekî sorî mezin di ber hemêzê ji der ve tê, -ca, min qurbana xwe bike, vî dîkî ser jê bike.

- Heyfa vî dîkî înkê, ji giştan bêtir ji vî hezdikim, çima ser jê dikî?

- Ew qurbana tehe, ezîzê dilê min!

51

Hertim, waxtê Karê rûdinişt, bi Saşa re xeber dida, guh dida wî û xeberdana wiye baqil û kemal, ew şikên kû dilê wê-de hêlîn danîbû, serê xwe bilind dikir û dilê wê diêşand. Nizanibû çima, wê he zanibû kû rojê bê Saşaê ji ba wê here û îdî wê wî nebîne, nenihêrî wekî tu kirineke wî, di tu gotineke wî de wê ew tişt texmîn nedikir. Saşa kû digot dayê, hezar dayê ji dev dibarîn. Bo kû pêşiya vê "bûyerê" bigre, Karê her kûr û dûr difikirî. Wê dixwest kû Saşa zû bizewicîne, lema jî guhdarbû, li çûyin-hatina Saşa mêze dikir, ka di wî de guhastin dibin an na, ne axir xortên van salan zû dil dikevin, zanibû jî, him di sinifa Saşa û him jî di gund de, qîzên rind hene. Di nav qîzên dibistanê de Sîsa Efo ji



giştan bedewtirbû. Karê ew dieciband û wê bi dil-eşq ew ji Saşa re bixwasta, eger kû wî jî dil bikira.

Karê bi fikrên xwe hê jî dût diçû, difikirî kû Saşa hilde û here bajar an jî di gundekî dût bijî û bixebite, lê paşê dîsa xwe bi xwe ji vê fikrê paş de vedikişiya. "Bi vê yekê birîn qenc nabe."

Dibêjin kû tu ji çi ditirsî, ew jî tê li te diwale. Karê zanibû zû-dereng ew mektûba bê, lê hîviyê nîbû, wekî kû ewê hema zûtire ji Saşa dest pê bike.

Awha, rojê havînê xweş, îdî roj diçû ava, hênikayî bi meriyan xweş dihat, Karê û jinên cînar di ber derî, vir de-wê de xeber didan, Saşa medekirî hat, kere-ker çû hundir. Karê texmîn kir kû tiştê li wî bûye, bo kû ew ne Saşayê berê ye.

Karê pêra-pêra li pey kur neçû: lezekî bi jinên cînar re xeberda, paşê çû hundir odê. Saşa deverû li ser kerevata vala palda bû. Dê çend cara jê pirsî kû çima wisaye, nexweş nîne, Saşa bersiva wê neda. Nan,

52

xwarin hanî da ber Saşa, gotê kû ewê paşê bixwe û dîsa berê xwe ji dê guhast.

Wexteka dereng êvarê, rûken bû, dê jê pirsî, çi dixwaze kû bixwe. Wî got, kû mastê pez jê re bînin.

Almastê zû-zû mast û nan hanî, Karê jî ji şikafa piçûk hingiv derxist. Wî xweş xweş xwar, kuta kir û vegeriya ji dê re got:

- Dayê, bibaxşîne, vê nîvroyê kêfa min tunebû, lema min bersiva te neda. Waxtê kû dê jê pirsî, lê çima kêfa

wî tunebû, ew xêlekê ker fikirî, paşê vegeriya û got:

- Dayê, ezê tişteki ji te bipirsim, tê ji min re rast bêjî?

Dilê Karê nişkê ve pirpitî, xudana sar kete eniyê, xwe girt, çevên kur nihêrî ...

- îsko, çima heta niha qet bûye kû ez te bixapînim? Te çi bîhîstiyê zû bêje!

- Dayê, min zû ve dixwest kû ji te bipirsim, lê min cesaret nedikir. Eva çend care di dibistanê de ji devê

zar an û caran jî dûr ve ji mezinan dibihê, wekî ez ne

kurê teyî helal im, wekî ez ûris im... 1italê kurê Efo,

birê Sîsê ji min re "ûrisê êtîmok" got. Dayê ez zanim di

vir de tişteki heye, wekî hûn gişt ji min vedişêrin. Ez êdî

zaro nînîm, min sinifa deha kuta kiriye, ji min re rast

bêje, ev çi îş e?

Saşa serê wî di ber de xeber dida, lê Karê dest-ling lê

sar bûbûn, dev-lêv lê zûha bûbûn. Bi zehmet ji kur re

got:

- îsko, zû şerbikek av ji min re bîne. Saşa serê xwe bilind kir, nihêrî kû dê, reng lê çûye, bi lez av hanî.

- Dayê çi bû, çima wisa reng ji te çû? Tu min tişteki xerav negot? Bibaxşîne dayê, min bi neheqî ew gilî ji te re got. Kê çi dixwaze bira bêje!...

- îsko, birê min, -dê ew hemêz kir -zû-dereng te yê ev

53

pirsa ji min bipirsiya, her rinde, zû ne dereng, -bi

zarîna, wê xwe havîte pêsîra kur. -Ez te nadime tu

kesî, tu kurê minî ... -Got û xwe negirt, giriya.

- Diya mine ezîz, -Saşa jî destê xwe stuyê dê re bir, -

çima kê dikare min ji te bistîne, tuyî diya mine helal...

Hîvî dikim negirî ... Hûn gişk ji min vedişêrin, çima?

Karê serê xwe bilind kir, li çavên kur nihêrî:

- Ezê ji te re bêjim, îskoyê min, ya rind ewe kû niha  
bêjim, ne kû paşê! ..

Pey vê xeberdanê, Karê he zanibû kû Saşayê bê guhastinê,  
wê biçilmise, di nav heval-hogiran de ser

berjêr be, neveşartî ewê hemû tişt jê re rast rast gotibû

û derheqê wan zehmet û derdê jiyana xweya giran de

xeber dabû. Ewê timê guhdar hatin-çûyina wî, xeberdan,

he~ kirineke 'wî mêie dýkir- û bi xofa dil d'ifikirî,

gelo ewê rast kir serhatiya jiyana wî rast jê re got, wê

negihîne wê yekê, kû ew bixwaze here ba diya xwe ya

helaL. Lê Karê tu tişteki wisa texmîn nedikir, hela li ser

de Saşa her gelekî bi wê ve û bi Almastê ve hatibû

girêdanê, bi can û qurban bi wan re xeber dida, her

cara, kû dihate hundir xwe dihavîte pêsîra Karê, henek

dikir, distira, direqisî.

Roja stendina dîplomayê Karê û Almastê xwarina

cure -cure çêkiribûn, şerav, fêkî, kade û tiştên din

danîbûn.

Berî êvarê, waxtê îdî hênkayî ketibû erdê, Saşa û

54

çend hevalên ji dibistana wî -Rezmik, Têmûr, Sûrîk,

Hrant, Hasmîk, Nazê û Tellî bi ken û eşq ketin hundir,

kulîlkên di destên xwe kû ji çolê çinîbûn danîn ber

pencerê û li dora texte rûniştin. Karê û Almastê

hahangê xwarin germ kirin, wekî daynin ber ciwanan,

lê pirqe-pirqa wan bûn, dikenyan, taybetî kenê hersê keçikan ew der hildabû.

- Meta Karê, -Têmûrê Cindî, kû xortekî henekhez bû û timê dikete kirê hevalan, dibêje, -ji bo Razmîk kevçî daneyne, ew timê kevçiyê xwe bi xwe re digerîne. Dîsa bû pîrqîniya gişka. Razmîk jî, kû hîviyê nîbû Têmûrê wî bide şermê, xwe winda nekir, got:

- Meta Karê, ji Têmûr re kevçî neyne, ew xwarinê bi tiliyan dixwe, eger berdevk heye, berdevkekê jê re bîne, ji bo ber pêsîrê xwe neke qirêj. Vê carê ciwan her bêtir kenyan.

Eferim Razmîk tu di bin gilyan de namînî, -Têliyê jê re got û ji gotina xwe soro-moro bû.

- Îsko, ka te digot hevalê te yên gişk bên? - Dê jê pirsî.

- Dayê, me îro qîrar da, sibê hemû sinif herin ser kaniya di piştta çiyayê me, lema jî nehatin. Em lezekî pêş de di mala Têmûr de berhev bûbûn, me wira jî qîrar da.

- We rast kiriye, di paşila tebiyetê de diha rinde, taybetî li ser Kaniya Sipî.

- Gelî zaran, -Sûrî bi nişkê ve got, -Ne Sîsê jî gotî bihata vir, çima nehat?

- Ji îsko şerm dike, -Têmûr vê carê kete kirê Saşa.

Saşa soro moro bû û li çevên diya xwe nihêrî. Karê li kur nihêrî, kenê şîrîn li rû, got:

- Çima, çi tiştê şermê di nav de heye? Niha jiyana wê yî herî xweş e, hûn gere ji hev şerm nekin.

- Na, meta Karê, Sîsê tenê ji îsko şerm dike, -Têmûr dîsa kete mabeynê.

- Sîsê qet ji kesekî jî şerm nake, çima derewan dikî Têmûr? Hesmik di ber giliyê wî de hat. Diya wê gazî kirê, çû!

- Yek jî, tu şerm nakî. Dixwazî bêjim tu ji kê şerm dikî?

- Yê baş, vî nedine xeberdanê, -Hesmîkê bi hêrs got, - lê wekî wisane çima dikî-nakî Lûsînê ji te şerm nake, hi? -Gişk kenyan.

- Bextê min e, we ez di dewsa lotiya danîme û kesek ji we ji min şerm nake. Gişk dîsa bi eşq û şa kenyan, lê Karê van xeberdan û laqirdiyên qîz û xortên ber miraz de, tişteki dizî texmîn dikir. Çend caran di ber guhên Karê ketibû, wekî Sîsê û Saşa çav berdane hev û ew bi vê yekê şa bû, lê dilê wê diêşiya, wextê giliya diya Sîsê dihate bîrê, kû ji jinên cînar re gotibû: "Sîsê di mal de pîr be jî, ez wê nadime îsko. "

Li ser vê xeberdanê û şeq-şabûna ciwanan, karkerê êtîmxanê hate hundir û gazî Karê kir. Ewê li sivderê mektûbek da wê, bû piste-pista wan, paşê Karê ew verêkir, mektûba kû hanî, kire paşila xwe, dîsa hate hundir: Saşa texmîn kir, wekî kêfa dê ket, kenê li ser rû wînda bû. Ewê xîret kir kû ciwanan mijûl bike, bi wan re bikene, şa bibe.

Paşê, wextê Saşa, heval-hogiran ve çûn, Karê azayî da kela dilê xwe, kû kom bûbû, hatibû li gewriyê asê bûbû.

Diya Saşa -Evdokiyayê, li ser navê dîrektorê  
êtîmxanê mektûb şandibû. Ew jî dinihêre, wekî di  
zerfê de mektûbek ji bo Karê ye, dide keçikekê, kû  
bidine Karê.

56

Karê mektûb danîbû ser çokê xwe, hêsir tijî çevan,  
cesaret nedikir kû veke, wê he zanibû ewê di destê wê  
de yê biteqe.

Almastê, wekî mîna ciwanan zû-zû ew der hevdida,  
li Karê vegeriya:

- Karê, çi bi te bû, dereke te naêşe? Wê keçikê ji te re  
çi got, di pey wê re te wisa reng havît? Lê Karê bersiva  
wê neda, mektûb vekiribû û qey bêjî ji vê dinê biryabû.

Almastê kû dît ew mektûbê dixwîne, femkir, wekî  
Karê ji kulê dinale, deng nekir, xebata xwe kir û di ber  
xwe de got: "Xwedê derdê dinê daye vê feqîrê ... Heyetuneye  
wê jinika ûris dîsa jê re nivîsiye ... "

... Xwîşka min a ezîz, -Evdokiyayê nivîsîbû, -ez bi  
xofa dil vê mektûbê dinivîsim, nizanim, tê wê bistînî an  
na, ji bo kû, wextê min bersiva mektûbên xwe yên  
çend salan berê ji te re şandî nestend, hatime li ser vê  
fîkrê, an tu ji wê derê cî guhastî bûyî, kû bawer nakin,  
an jî, tu bi taybetî bersiva min nanivîsî û ez fem dikim ji  
bo çiyê. Carina xwe bi xwe difikirim; gelo dibe Saşaê  
min tune? Wan salên bi zehmet çi bêjî dibin. An jî difikirim,  
Saşa di êtîmxanê de mezin bûye, kê zane kuda  
birine û em nikarin hev bibînin. Hesîna dilê min dayika  
reben dibêje, wekî Saşaê min li rûbarê dinyayêye, lê

destê min nagihîjê. Eger ev mektûba min bikeve destê te, tuyê ese texmîn bikî kû min çima ew li ser navê dîrektorê êtîmxanê şandiye. (Min ji dîrektor re jî cihê nivîsiye). Rast e, salên dirêj derbas bûne, lê ez difikirim, ji karkerên êtîmxanê yên kevn wê merî hebin, kû zanibin Saşaê min kuda birine, ew heye an na? Wextê derheqa van pirsan de difikirim, hindik dimîne sewdeserî bibim. Ez zanim, tu niha min gunekar dikî û dibêjî: "Ev çi dê ye, kû hewqas sal derbaz bûne, carekê neha-57

tiye, bi qedera kurê xwe ve mijûl nebûye?. Ez digihîjime halê dîn bûnê, wextê difikirim: Lê çawa min qebûl bike, wê awqasî quwatê di xwe de bibîne, min rast fem bike? Ev fikran dilê min dişewitîn, gav û saet ji serê min demayên. Xwîşka min a delal, Karê, eger vê mektûba min bistînî, hîvîdar im çend rêza ji min re binvîse. Ez niha li Moskovayê dijîm, min adrêsa xwe di axriyê de nivîsiye; gelekî hatime guhastinê, lê bêtir rinde di derheqa xwe de ji te re hûr gilî binivîsim ... .. Ez kû ji mala te çûm û kerîkî dilê xwe li ba te hîşt, min çi zehmet û feqîrî kişand, bira neyê serê gurên çiyar. Bi heftan parî nan bi dest min nediket. Wan rojên giran, jin, li serê wan riyar ketibûn ... Ya kurt, wextên wisa hebûn, wekî min dixwest xwe bi xwe tiştêkî bînim serê xwe, ji wê pêrîşaniyê xelaz bibim ... Ez ber bi Ûkraynayê diçûm, mektûba Nîkolayê mêrê min, ya paşîn ji wir hatibû. Min, ew wisa jî nedît, rojên gelek giran bûn ... Çi serê te biêşînim, Ji min re li hev

hat, bikevime nava pareskerekî, kû diçû ber eniya  
şer... Min feqîra xudê, de şer e, dikevîne qeleça, agir  
dikin, kê-kê kuşt! Lê na, Karê vê perîşaniyê û zehmetiyê  
nikarî bi zar bêjî, an jî binivîsî, gotî tu bi çevên xwe  
bibînî. Di nav wan mêşa û cimciman de me birîndar  
cîguhastî dikir, birînên wane giran girê dida, bi heftiya  
çev nedida hev û niha, gava ew roj dikevin bîra min, jan  
bi canê min dikeve, ecêbmayî dimînim, çewa ez sax  
mame? Ez hatime ser wê fikrê, wekî çap û hidûdê kû  
sebra meriya tune, ew ber zehmetên hê mezin dikare  
sebir bike.

Bi kurtî, ji bo kû dirêj nenivîsim, bêjim, wekî pareskerê  
kû tê de bûm, sala berî kutabûna şer, dawiya sala  
1944'a îdî li ser erdê Germany faşîstiyê şer dikir. Rast  
58

e, dîsa şerên mezin dibûn, lê em wisa ruhdar bûbûn,  
wekî ji gulan jî neditirsiyan, pêş de diçûn. Hema vira  
pareskerê me û pareskerê kû Nîkolayê min tê de bûye  
û şer kiriye, rasû hev hatin. Serequmandarê wî, heval û  
hogirên wî dora min girtin, di .ber dilê min de hatin ...  
Nîkolay di şerekî bo azakirina Ûkraynayêyî giran de  
hatibû kuştinê ...

Gumana min wisa zêde bû, Karê can, wekî ezê wî  
sax bibînim, pey kutabûna şer emê bi tevayî bîn. Saşaê  
xwe hildin-bînin û bi jiyana nû ve bijîn. Lê Xwedê ew  
bext nedabû min. Kê zane wê çi bihata serê min, eger  
rastî Gênadî nehatama ... Min gunekar neke, Karê, min  
pirs-qîrar dabû di pey Kolya navê mêra heram bikim,



lê kes, çawa dibêjin, ji qedera xwe nareve ... Gênadî xortekî bi hîvî, baqil û kemal derket. Devederî salekê me bi tevhev şer dikir. Ew giran birîndar bû, ew hanîne piştê, lê ez mam. Paşê, îdî pey kutabûna şer, me hevdu dît û em gihîştine hev... . -

Ezê bêjim, Karê, dibe kû tu bawer nekî û min gunekar bikî. Demeke wisa hat, bi min wisa hat kû ez di dinyayê de ya herî bextewar im, wedekî, qey bêjî, min rojên buhurî yên bi zehmet, Nîkolay û Saşaê xwe ji bîr kiribû ... Ez û Gênadî bi jiyaneke şa û bextewar dijiyan. Birînen dilê min dikeviyan, dewsa xemên min tijî dibûn, bi tay beû di pey bûyina zara me ya qîzîna kû me navê wê daniye Karê, em wê bi navê Karra, an jî Klara gazî dikin ... Gênedî merivekî gelekî dilbêj û dilnerm e, di derheqê te û Saşaê xwe de min hertişt jê re gotibû. Ew bi xwe jî dixwaze we bibîne ...

Karê, xwîşka min, ez gelekî dixwazim bizanibim, gelo Cemalê te vegeriyaye an na? Min di mektûbên xwe yên pêşîn de jî hîvî kiribû kû derheqê Cemal de ji

59  
min re binivîsî, lê heyf, min tu bersiv nesitand. Ji arşîvên eskeriyê ez pê hesiyam, wekî Nîkolayê min li kêderê şer kiriye û hatiye kuştinê. Ew bajarekî Ûkraynayêyî piçûk e, -Lûske. Ez û Gênadî çûne wira Karê, min ji çevên xwe bawer nedikir, wexta li ser gora biratîyê di nav navnîşana şehîdan de navê Nîkolayê xwe û navê Cemal xwend, -Asoyan Cemal îsoyevîç. Ez bi metelmayî sar bûbûm û sekinîbûm.

Gênadî di ber dilê min de hat, ez didame bawerkirinê kû wekî qey ew Cemalê dine, çima di jiyane de tiştên wisa kême dibin? Du sal berê bû. Ez, Gênadî û Karra min em çûbûne Ûkraynayê (Gênadî bi xwe ji Ûkraynayêye). Wê salê deh saliya serketinê pîroz dikirin. Min cesaret nedikir kû di derheqê vê yekê de tiştêkî ji te re binivîsim, min nedixwast derdên nû li ser derdên te zêde bikim. Ez gazî Xwedê dikim, Karê, ew Cemalê kû me navê wî di navnîşanê de xwend, ne Cemalê tebe. Dibe kû niha Cemalê te li kêleka te rûniştîye, hûn bi tevayî mektûba min dixwînin, Xwedê bike wisa be!..

Lê eger, Xwedê neke, ew rastiyê Cemalê tebe, wisane bi qudreta Xwedê qedera me bi hev re girêda yiye...

Karê can! Caran bi xwe xwe difikirim: Gelo Saşaê min zane, wekî kû diya wî ya helal heye, an jî dibe kû we jê re qet tu tişt negotiye, ew hew zane? .. Bibexşîne, Karê destê min nagire kû binivîsim ... Hesînê dilê min hev înkâr dike, rehetiyê nadine min. Caran ez difikirim, dest nedime birînên dilê te. Ez te fem dikim, eger te Saşa mezin kiribe, niha hûn wisa bi hev re hatine girêdanê, wekî mîna mirinê zehmet e ji hev biqetin. Lê, Karê can, min rast fem bike, ez jî dê me, ez nikarim

60

Saşaê xwe ji bîr bikim, ew timê li ber çavên min e, rast e, ez dikim-nakim nikarim texmîn bikim kû çawa mezin bûye, çi bejn-bal pê ve ye; gelo mîna bavê xwe

bilind e, çavsût e? Gelo di wî gundê Kurdayî dûr, çawa  
berbirî wî dibin? Bi ya kurt, xwîşka mine ezîz, hezar û  
yek tehr fikir têne serê min, çiqas kû diçe bêsebir  
dibim, dixwazim wî bibînim. Bîrnekim bêjim, Karê,  
hingê kû ez bi te re bûme nas, bi pirs-pirsiyara, ji kitêb  
û rojnaman gelek tiştî derheqê milletê we de pê hesiyam.  
Ew milletekî rojhilatêye here kevin e, kû niha bi  
mêrxasî şer dike ji bo azayî û serbestiya xwe. Min di  
kitêbên cure bi cure de rabûn-rûniştandina xelqê Kurd  
xwend û ez gelekî kêfxweş im, wekî jinên wî milletî di  
nav temamiya rojhilatê de yê here aza û mêranîne û  
Saşaê min ber destê jineka wisa mezin û terbiye dibe ...  
Bi kurtî, xwîşka min a ezîz, derheqa derd û kulên  
xwe, xem û xeyalên xwe de kû binivîsînim, defter û  
qelem têrê nakin. Ya rind ewe kû bi xwe bêm, bi çavên  
xwe we bibînim, rûnên û dirêj xeber bidin. Gelo ezê  
we bibînim? Nizanim çima baweriya min kême e. Lê  
bivê-nevê ezê bêm. Ezê bêm, wekî wan cî-warga  
bibînim, li kû Saşaê min mezin bûye û geryaye. De bi  
xatirê te, ezîzên dilê min!

Bi silavên dêtiyê û xwîşkiyê. - Evdokya."

.....

Di pey standina mektûbê Karê ciyê xwe yî rihet, qey  
bêjî dinya li ser hatibû hev, destên wê şuxul nedigirt.  
Ew fikir ji serê wê dernediket. Eger Saşa here, wê bi  
tenê çawa bike? Diya wî bi eşkere nivîsiye, wekî wê bê.  
Ew kû hat, dê û kur hev dîtin, îdî destên wan ji hev

nabe ...

Ciyê kar jî ew wisa perîşan bû, di vir merivê tek-tenê Vîktorya bû, kû karibû şewra xwe lê bikira, lê ew jî bi bexta re ne li vir bû. Kete bîrê, wekî Evdokyayê mektûbeka waha ji dîrektor re jî şandiye, wisane haya wî ji her tişo heye, gelo ew çi difikire?

Ev hindik nîbû hela ser de ewê birîna dilê wêyî îdî kewgirtî jî vekir û Kara xêrnedî nizanibû yê ber kîjan êşê sebir bike. Cemalê wê û bavê Saşa di cîkî de şer kirine, li cîkî hatine kuştinê, di gorekê de hatine definkirinê ... Kî bawer dike? Gelo di fikra kê re dikare

derbas bibe, wekî vê dinya fire û mezin de qedera du merivên nenas wê bê, ha bi hev bialive? Dikare bibe, Cemalê wê û Nîkolayê bavê Saşa hev nas kirine, li kêleka hev di pêşiya dijmin de şer kirine û nizanibûne, wekî di paş wan, bi hezaran kîlometre ji wan dûr, jiyana lîstikeka dinê ji bo wan hazir dike? Kê ya jiyane zane, çi bêjî kû nayine serên meriyan?

Sivdera êtîmxanê ya dirêje fire de Satîka pîr gêzî di dest de pêşiya Karê girt.

- Karê, ez qurban, ez jî li te digeriyam, Badalyan gazî te dike. Digot hema Karê kû tê, bira bê ba min.

Badalyan merîvekî dinyadîtî, ceribandî û pedagog bû, zana bû. Bi salên dirêj wî serkariya êtîmxanê dikir. Ewî hemû karkerên xwe rind nas dikir, lê serhatiya jiyana Karê bi her alî zanibû, qedrê wê ji giştan zeftir digirt. Çend caran pirs pêş de hatibû kû wî bidine ciyên bêtir baş, di cîkî hê bilind de bixebite, lê ew razî nedibû û

sebebê neçûyina ~î yek bû; gişkan zanibû, wekî ji bo xwastinên awha ew dibêje: "Heta hemû zarên kû di êtîmxana min de hene bi firê nexim, tucara ji vir naçim!"

62

Ewî Karê li ser piya qebûl kir û da rûniştandinê.

- Tê kifşê, tu ne qencî Karê!. ..

- Erê, Aşot Mîxayîlîç, -Karê serê xwe kire ber xwe, got, - eva du roje xirab radizêm, qey ji wê yekê ye.

- Diya Saşa ji te re çi nivîsiye? Ji min re nivîsiye û hîvî kiriye, wekî em di derheqê Saşa de jê re binivîsin .. Ewê xênjî vê mektûbê, ji te re dîsa nivîsiye?

- Eva mektûba sisiyane ... Min bersiva mektûbên wê neda.

Xêleke xurt herdu jî ker difikirin. Dawiyê de Badalyan xeberda:

- Qey tu dixwazî xwe û Saşa veşêrî? Wisa nabe Karê, gotî bi tehrekî din bifikirî. Çiye, ew dixwaze bê, Saşa bibe?

- Nivîsiye kû ezê bêm ... Eger hat, wê bibe! -Karê bi dengê nizm got, kela xwe negirt, destmala xwe derxist ber bi çavên xwe bir ...

- Bi girî pirs nayên safîkirinê, Karê, eva pirseke gelekî bi zehmete. Lê Saşa çi difikire, haya wî ji mektûbê heye, zane diya wî yê bê?

- Di derheqê mektûbê de agahdar e, lê nizane diya wî çi nivîsiye. Hîviyê bûm, wekî ewê bi xwe bixwaze bizanibe kû diya wî çi dinvîse. Lê qet reng neda, ker li

kêleka min rûnişt û di ber dilê min de hat, " li ber xwe nekeve dayê" got û derkete der.

- Serê hemû giliya niha Saşaye, Karê, tenê ew dikare qirar bide, wê xwe kîjan alî bigire.

Lê wextê Karê bi Badalyan re xeberda, wekî Evdokyayê di derheqê Cemal çi nivîsiye, Badalyan metelmayî li çavên Karê nihêrî, xêlekê nizanibû çi bigota.

- Erêêê ... -Badalyan di ber xwe de got, - a ji te re qeder! Di jiyânê de tiştên awha kê m dibin. - Badalyan  
63

demekî kurt ker fikirî, paşê got:

- Di vê pirsê hevpiçikî de gilyê dawiyê digihîje Saşa.

Ew îdî xort e, gihîştîye, qirarên rast ew dikare bide ...

Te qet di derheqê vê pirsê de pê re xeberdaye, texmîn kiriye ew li ser çi fikrê ye?

- Zû ve rojekê medekirî hat malê, -Karê got, -wextê min jê pirsî çima wisane, ewî şilovekir, wekî wextê lîstikê wî û hevalan ji hev derbaz bûye, yekî jê re gotiye: "ûrisê êtîmok". Saşa, gere bihîstibe, wekî ew ne kurê min î helale, min ew yek texmîn dikir û eva jî bû sebeb, wekî derheqê vê yekê de cara ewlîn ji min bipirse.

Min jê veneşart, hemû tişt gotê û kela xwe negirt, jê re got, wekî ez wî nadim bi tu kesî! Ew jî di ber dilê min de hat, got: "Kê dikare min ji te bistîne". Hemû awqas. Ev gotina wî û berbirîbûna wî ber bi min hewekî gumanê dide ber dilê min. Caran jî, Aşot Mîxayîlîç, difikirim, bi xwe xwe dibêjim, diya wî ya helal e, merî ye, kê zane te hew nihêrî xwe bi wê girt?

Ez jî, bi we ve eyane, nikarim bê wî bijîm, terq-ferqa mm ew maye.

- Min bihîstiyê kû tu derheqê zewaca wî difikirî, rast e?

- Erê, Aşot Mîxayîlîç, dilê min dixwaze, lê...

- Çiqas ez Saşaê te nas dikim û min bihîstiyê di nav ciwanên gund de ew xortekî herî baqil û kemal e, gişk di derheqê wî de qenc xeber didin... Diya wî mêr kiriye, zara wan heye. Saşa jî bi hezar benda bi te û bi xelqê gund ve hatiye girêdanê ... Taybetî hevhezkirina wî û qîza Efo nîşan dide kû wekî eger ew bixwaze jî nikare ji te û gund biqete. Gotî wisa bikin, pirsê zewaca wî zû bê sêrî. Rast e, dê û bavê Sîsê li himber dertên, bi texmîna min ew ne ji bo qusura Saşa ye, lê ji edetên

64

milletiyê ditirsin. Gotî merivên gund yê qedirgir, xweyhurmet têkin nav ... Eva gişk rast e û bo feydê teye, lê jina ûrîs diya wî ya helal e, kes nikare heqê dê û zara helal pêpes bike. Evê yekê ji xwe re neke bedbextî, çawa tê kifşê ewê bê û gere tu sebir bikî kû heta ev pirsê bi riya heqiyê tê safikirinê. Dibêjin kevir hol dibe, tê li ciyê rast disekine. Lê pirsê Cemal, ji te re bêjim, gelekî bi min tesîr kir. Eger bi rastî ewê û bavê Saşa bi tevayî şer kirine, ji bo welat hatine kuştin û bi tevayî kirine gorekê, wisane qedera te, Cemal û wan mêr-jinê ûris, çawa xelq dibêje, ji xwastin û qudreta Xwedê bi hev re hatiye girêdanê. Tu çi dikarî bêjî, jiyan e.

- Ez dixwazim, Aşot Mîxayîlîç, Xwedê hezbike ev

pirsa bi rindî safî bibe ezê herim wî bajarê Ûkraynayê,  
gora Cemal bi çevên xwe bibînim ... Karê dîsa xwe  
negirt, giriya, Badalyan di ber dilê wê de hat:

- Qeder, qeder ... Te kiriyê serê xwe! Çima qedera te  
tenê awhaye? Bi milyonan hatine kuştinê, awqas mal  
wêran bûne ... Tu tenê ya xwe zanî. Çiqas-çiqas mîna  
te, lo hela ji te xerabtir hene, kû bê mal, bê zar-zêç, bê  
xwey-xudan mane, lê ew çawa dîkin? Te çima wisa  
dest ji ber xwe hildaye? Kûr-dûr bifikire, xwe wisa  
bêguman neke. Ez vê xwestina te baş dibînim. Lazime  
û hêjaye tu herî li ser gora Cemal kû jiyana xwe ji bo te,  
Saşa, min û hemû kesên kû îro dijîn, dixebitin da. Di  
aliyê din de jî gere tu bi ser xwe bî, wekî şêrekî mîna  
Cemal destgirtiyê te bûy, heqê te tune kû tu li pêş  
zehmetên jiyânê wisa serê xwe berjêr bikî!

Ev gotinên Badalyan kete hişê Karê. Dîrektorê  
dinyadîtî rast dibêje, gotî li pêş zehmet merî belengaz  
nebe, gere xîret bikin û li himberî van zehmetiyan serkevin.

65

Payîza dereng bû. Tîna tavê îdî şikestibû û ew dereng  
dereng derdiket, şilî-şoyî bûn. Gundiyan zimêrên  
xweyî zivistanê didane serhev, diçûne bajarên nêzîk,  
karê xwe dikirin, zanibûn zivistana Mêrgesorê girane,  
hemû rê têne girtinê, lema jî hemû cure êmîşê ter û  
tiştên din dikirîn-dihanîn, wekî wextê edetên Kurdan li  
ser sifran tu tişt kêr nebe. Karê jî çubû bajêr, vegeriyabû,  
ewê ji Saşa re kincên nû, solên rind kirîbû ... Ewê  
bi niha ve tivdarekê xwe dikir: Pirsê zewaca Saşa ji her



tiştî zêde ew mijûl dikir.

Almasta diya Ûsiv nexwaş, di nav cî-nivîna de bû.

- Înkê, tu îro çewanî, himberî duh tu îro xwe baş nabînî? -Karê nêzîkî wê, jê pirsî, -Medê te diçe çî, ji te re bînim?

- Na qîza min, medê min tune. Duh û îro, îro qey bêjî hewekî pakim. Ji bo min nefikire lawo! Ez îdî ketime, ez bi têra xwe jiyame, tenê miqatî xwe û îskoyê min bibe. Fatê jineka baqil û heyfe, çima wisa hişk e, nizanim?

- Karê, qîza min, - Almastê got, - gura min dikî dîsa jî here bi Fatê re xeber bide, ew ne yeka wisane, qey hinek navtêdidin? Çima xêrnexwazê me hindikin? Nexweşiya Almastê her kû çû lê giran bû. Karê û Saşa xemxur û bi dilovanî miqatî lê dikirin, tenê li ber serê wê rûniştibûn, gazî doxtir an dikirin, dû-derman jê re dihanîn, lê çare pê nebû. Du heftan şûnda ew çû rehma Xwedê. Karê şîna giran ser diya Ûsiv kir, bi qedir û qîmet defin kir û xêr-xêrata wê da. Bi wê yekê ew di ber çavên der-cînarên, tevayiya gund hê bilind bû.

66

Di pey kutakirina dibistanê, îsko roj bi roj dihate guhastinê.

Tijî bûbû, rî û simêlê wî îdî şîn dibûn. Lê hingê derheqê fikra dê û bavê Sîsê hesyabû, taybetî di pey mektûba dê, timê medekirîbû, kêm xeber dida, bawer bikî dervedikete der ve. Karê ev yek texmîn dikir, lê derheqê van pirsan de nedixwest kû xeberdanê veke. Îsko di mesela Sîsê de dilê xwe li ber dê vekiribû, tiştêk

jê venedişart, waxtê gilî dihate xeberdanê, mîna mezina difikirî, qîmet dida fikir û şêwr-şîretên Karê, lê pirs hebûn kû bi diya xwe re nedibû yek, bê hêrs bûn, bi aqil pê re şilovedikir ka mesele wê çawa be û dixwest wê bide bawerkirinê. Lê di pirsê diya wî de Karê çend caran ew leqandibû, lê wî xwe li kerrî danîbû, bersiva wê nedabû. Dihate kivşê nizanibû rê bide kîjan hesîna dilê xwe, kû bi şidyayî li hember hev sekinîbûn. Dilê Karê ji vê yekê baristan dibû, wekî ewê di nav xeysetê Saşa de guhastinên xerab ber bi xwe nedidît. Ew dîsa mîna berê bi qedir û hurmetbû, ji gura wê dernediket, hezkirina xwe ber bi wê venedişart.

- îsko, birê min, çima wisa medekiriyî? -Dê jê pirsî.

- Bîhna min dernayê, dayê, hemû roj di malê de rûniştîme, an ji min re cîkî bibîne, herim-bixebitîm, an jî ezê serî lêdim bira min bişînine eskeriyê ...

Karê texmîn dikir, wekî bîhtengiya wî ji betalbûnê nîne.

- Hela wexta teye eskeriyê nîne, kurê min, xebat jî hela zûye, ev çend mehe te dibistan kutakiriye, bi lez nekeve, dema bê, tê herî eskeriyê jî, bixe bitî jî. Awqas hevalên te hene, here ba wan, bira ew bîh vir, ji bo kû

67  
bîhna te derê. Saşa ev gotina dê bi kerrî buhurand, îdî femdarî bû, wekî pirsên dinê dilê Saşa diêşand.

Bihara dereng bû. Hingê dibistan kutakiribû Saşa, dereng-dereng Sîsê didît. Car-caran, wextê hewa xweş bûya, ew û hevalan diçûne çayiran digeriyan, wî Sîsê li

ber derî didît, ji dûr ve li hev dinihêrîn, lê cesaret nedikirin  
kû nêzîkî hev bibin.

Rojekê li ser kaniyê Hasmîkê Saşa dît û gotê:

- Îsko, tu çima naêyî kivşê? Ez, Têlî û Sîsê îro diçine  
pincarê, dixwazî tu jî were.

- Hûnê kingê herin?

- Tu pêşiya me here, li pişt Girê Sor, emê saetekê  
şûnda li pey te bîn.

Saşa zû çû malê, kincên xwe guhast û lezande pişt  
Girê Sor.

Gîha îdî dirûbûn. Girê Sor mîna bûka bi xêlî dûr ve bi  
reng-awazê keskesorê diteyîsî. Kulîlkên biharê yên bi  
hezar rengî, kû rex kaniyê hela mabûn, merî ber bi  
xwe dikişandin.

Saşa li ser kaniyê, di nav wan kulîlkan de digeriya,  
car-cara xûz dibû sorsorkên nûvebûyî diçinî.

Saşa, kû bi xeysetê xwe ve xortekî'bi hemdê xwe bû,  
niha nizanibû çima bêsebir bûbû, dilê wiyî ciwan û  
evîn zû-zû lêdixist, çevên xwe ji riya gund nedibirî.

Ji saetekê zêdetir derbaz bûbû, lê Hasmîk, Têlî û Sîsê  
nedihatine xuyanê. Xêlekê şûnda çend karkerên gund  
kêlendî li ser milan ji mêrgên jorîn ber bi kaniyê dihatin.

Saşa xwast xwe cîkî bitelîne, .lê paşê ji wê fikrê  
paşda vekîşiya. " Têlî bira bîn, ez bi xwe re digirim," -

68

xwe bi xwe re got. - Gundî hatin nêzîkî wî bûn. Reşîdê  
Omer, kû li gund ji giştan bêtir ji Saşa hez dikir, silav  
dayê û jê pirsî:

- Îskender, çi qewî tenê yî, heval-hogirên te li kune?  
- Xortî bengiye, -Rustemê Teyar bi laqirdî got, - hela binihêrin, baqê kulîlkên çawa çiniye?  
- Kuro, tu çiqasî berzeqî, -Reşîd û Tosin li Rustem hilatin,  
- çima evîntî qedexe ye, bona gişka edet e, lê bo îsko çima bêedet e? îsko can, em ji evsenetiyên Rustem naxeydin, tu jî nexeyde!.- Na, naxeydim, apê Reşîd, çima çi gotiye, wekî ez bixeydim?

Hema wexta vê xeberdanê berê ewlîn îsko, paşê hersêkê hatî bi dûr ve dîtin kû sê qîzik ber bi kaniyê tîn. îsko tevhev bû, lê Reşîd û hogirên wî lez-lez kêlendiyên xwe danîn ser milên xwe, xatirê xwe ji îsko xwastin û çûn.

Hasmikê, Têliyê û Sîsê ji dûr ve Saşa texmîn kiribûn, lê wextê dîtibûn kû ew tenê nîne, riya xwe guhastibûn. Saşa jî xwe da wî hevrazê piçûk. Qîzikan kû dît Saşa ber ve wan tê, dîsa riya xwe guhastin.

- Roja te bi xêr, îsko, Hasmîkê got û destê xwe dirêjî wî kir. Paşê Têliyê û Sîsê ew bi destan silav kirin.

Wexta dawiyê de Saşa destê Sîsê girt, qey bêjî şelê agir kirine kefa destê wî. Sîsê jî ew yek texmîn kir û destê xwe paşda kişand. Sûret lê sor bûbûn, sor û sipî wisa li rûyê wê dihat, teyê bigota ew jî kulîlkeke devê vê kaniyêye.

Sîsê di nav qîzên Mêrgesorê de ya here bedew bû, mîna berfa yekşevî qerqaş bû, çavên wê gir û reş bûn, birî-bijangên wê qey bêjî bi qelemê kişandibûn. Rûyê wê bi dûr ve gilover tê xuyanê, lê wextê nêzîkva lê

dinhêrî, çena wêyî piçûk qey bêjî ji herdu sûretê wêye  
69

sor Û sipî cuda dibe. Pozê wê piçûk, lêvên wêyê mîna  
xwaşxwaşka nû fitqî rind hevdu dihatin. Lê waxta kû  
dikene, herdu sûretê wê qul dibin, pozê wêyî piçûk di  
ber fincika de hevekî kûrda diçû. Bejn-bala wê ya  
bilind, ser milên wê, gerdana wê ya qerqaş û berbistanê  
wê qey bêjî heykelekî mermerî destpêneketiye.

Çavên hemû xortên gund lê bûn. Çend meriya gilî ber  
Efoyê bavê wê re havîtibûn, lê wî red kiribû û nedihîşt  
kû ew xênjî dibistanê bi cîkî de here.

Sîsê bi xeysetê xwe ve jî bedew bû, Xwedê tiştê wisa  
kêm dide meriya. Ew berbuhêr û hevalhez bû. Mîna  
Fata diya xwe dengekî xweş lêbû, gelek kilamên  
mêraniyê û evîntiyê zanibû Di dewatan de bese yekî kilameka  
nû bigota, pêra-pêra hildida. Lema jî, pey  
dersan, wextê kom dibûn û bi cîkî de diçûn, giştan hîvî  
ji wê fikir kû bistirê û ewê red nedikir.

Hasmîk û Telî bi qesta pincar komkirinê dûrketin,  
Saşa û Sîsê tenê hîştin. Herdu bengî çûn ber tûmekî  
bilind rûniştin.

- Sîsê, hingê me dibistan kuta kiriye, wisa bûme,  
bîhna min dernayê. Taybetî bê te, ez wisa zanim kû ev  
dinya valaye. Çawanî, dê û bavê te qet çi dibêjin?

- Wê çi bêjin!... Ew tu qusûrê di te de nabînin. Tenê  
kirine serê xwe, wekî kû tu ne ji milletê meyî, -Sîsê got  
û him jî ji gotina xwe şerm kir, serê xwe berjêr kir, -ez  
tevî xebardana wan nabim. Diya min hebekî hêvî tê de

heye, lê bavê min ...

Saşa serê xwe kiribû ber xwe, ker guh dida Sîsê, nizanibû çî bigota.

- îsko, bi texmîna min Evelîna Rubênovnayê bi bavê min re xeberdaye, ji xeberdana diya min û wî dihate kivşê. Tê bîra te Evelîna Rubênovnayê waxtê kû  
70

carekê bi min û te re xeberda, got, wekî wê diya min û bavê min bişêwire.

- Sîsê, - Saşa serê xwe bilind nekir, got, - tu zanî dilê min ji çî diêşe? Ji vê yekê, wekî bes nîne, kû dikevîne nav bext-mirazê me, hela serda jî miletîya min kirine qerfa serê min ...

- Çî qerf? - Sîsê hêdî milê xwe li milê wî xist, bi curekî xeyd got, - tu bi xwe zanî, wekî ew ar nîne. Paşê, kê çî dixwaze bira bêje...

Saşa, pey vê gotinê re, serê xwe bilind kir, bi dilovanî li çavên Sîsê nihêrî, destê xwe di ser hu stûyê wê re bir, nerm ew bi sîngê xwe ve givaşt. Cara ewlîn lêvên herdu bengîya gîhîştine hev û xêleke xurt hev bernedidan- Sîsê, lê wekî dê-bavê te wisa hişk li ser fikra xwe bimînin, tê çawa bikî?

Sîsê, kû hîviya pîrsa awha nîbû, qey bêjî xof kete dil, bi carekê metelmayî li çavên Saşa nihêrî, dilê xwe de bi xwe xwe got: "Bi rastî, ezê çî bikim?"

- ez zanim ezê çawa bikim, -hebekî şûnda bi carekê de got.

- Çawa ... ? -Saşa bêsebir hîviya bersiva wê ma. Ewê jî

qestbenda bersiva xwe dereng dixist û bin lêvan de dikeniya.

- Tê çi bikî? -Saşa dîsa pirskir.

- Kê derê tu, wê derê jî ez!

- Sîsê, -Saşa ew dîsa hemêz kir, - min wisa jî zanibû.

- îsko, tu çima wisa dibêjî, dibe kû li ser hizkirina min

şik berî? - Sîsê di hemêza wî de, jêr ve li çavên wî

dinhêrî. Saşa dewsa bersiva .pirsa wê bide, ew bêtir bi

quwet sîngê xwe ve givaşt û şîrîn-şîrîn ramûsa.

- Rast e, te bi xwe derheqê xwe de tu tişt ji min re negotiye,

lê bawer bikî hemû zanin tu kiyî. Ez qet bi tu

71

tiştî texmîn nakim kû tu ûrisî. Pakî zimanê ûrisî jî

nizanî. Lê di nav me giştan de tu zimanê ûrisî rind hîn

dibûyî ... Saşa, - Sîsê nişkê ve ji hemêza wî derket, - min

bîr kir ji te re bêjim. Wê rojê Reşîdê Omer û çend

mêrên gund yên din ber deriyê me rûniştibûn, bi bavê

min re xeber didan. Ez ji avê û li ser xeberdana wan de

hatim.

- Hema hêja apê Reşîd bi du hevalên xwe ve li

virbûn ... Ez ji apê Reşîd hiz dikim, ew merîkî gelekî

qenc û heyfe, - Saşa got û pirsî:

- Wî ji bavê te re çi digot?

- Ez kû hatim, wî dengê xwe nizm kir, lê waxtê çûme

hundir, min xeberdana wî rind bihîst. Digot: "Canê

min hela ji min re bêjin, çî ûrisa di wî xortî de heye, we

kiriye serê xwe, ûrise ha ûrise! Li wî, xeberdana wî,

rabûn-rûniştandina wî dinhêrî, bi çend cara ji ciwanên

meyên din baştir e... Hela bêje, Efo, te çi qusûr di wî

de dîtiye? Hema em miletê ûris hildin pêş çavan, axir ev miletekî dinyayê yî herî bi rehm û qenc e, xudênas! Qedera wî xortî jî rûyê vî şerî, awha li hev hatiye. Karê jî, bi Xwedê ve eyane, jineka bi nav-namûs e, ew mezin kiriye, çawa hewceye wisa terbiye tore dayê, xort jî ketiye kirasê me, îdî çi dixwazî, hela bêje! Em xilazkiryê kê ne? Hûn ciwan in, nayê bîra we, salên reve-revê ji destê Roma Reş, wextê em ji welatê xwe derketin, kê em xelazkirin, hi? Em çima dûr diçin? Di vî şerî de ûrisa nebûya kê zane ew Hîtlerê merivxur wê çi bihaniya serê me? We ji bîr kiriye?

- Paşê? Te îdî çi bihîst? -Saşa dîsa ji Sîsê pirsî, kû demekê ker bûbû.

- Wî çaxî ji aliyê malê diya min gazî min kir, min bi lez av bir valakir, dîsa hatim, di taldê derî de sekinîm.

72

Axiryê de min bîhîst: " Heyran merî meriye, tenê bira qenc be. Paşê, li ba Xwedê guneye kû bikevine nav bext-mirazan, ciwanin, ji hev hizdikin, çima dikevîne navberê? Yê jorîn bo bext û qedera van ciwanan, wisa qerar daye, em çi dikarin bikin ? Ez zanim, xof di dilê te de heye Efo! Çare ji bo vê yekê jî dibe, tu zanî? Xwedê waxta kû derd dide, derman jî pê re dide. Eger tu dixwazî ew xofa ji dilê te derê, bi erf-edet xort bibe ocaxa Sefo. Bi Xwedê ve eyane, ocaxa wan ziyareta herî baş e, bira dua-duruzga bike, bira wî xortê heyf bîne ser dîn-donê me, kuta bû çû! Ez rast nabêjim, Tosinê bira?" Tosin giliyê apê Reşîd tesdîq kir, got:



"WeHe, giliyê rast raste, Reşîdê bira! Kê ji me qusûra wî xortî dîtiye? Canê min, rastiya Xwedê hildî, qet birina ber ocaxê jî ne pêwîst e, jo bo kû Rebê min meriv çêkir, wekî hev ruh daye ber gişkan, ûris jî, Ecem jî, Kurmanc jî, lo hemû milletên din jî qûlê Xwedê ne. Reşîdê bira rast dibêje, ev xorta biyanî bûye di nav me de mezin bûye, erf-edetê me, zar-zimanê me ji me rindtir zane. Lê eger tu dixwazî dilê te û xwîşka Fatê de tu şik nemîne, çewa Reşîd dibêje, îskender bibe ber ocaxa Sorê-sora, bira dua-duruzga bikin, wirda çi heye? Ez bi mala Xwedê kim, qusûra xort tune. Eger ji me pirs dikî haye, lê çewa dibêjin, malxê malê riya malê dizane, çi dibêjî Reşîdê bira?

Di pey vê yekê diya min gazî kir, wekî alîkariyê bidimê, nan lêxe û îdî min xeberdana wan nebihîst. Paşê, xêleke xurt wan dîsa xeber dida. Waxta kû bavê min hat hundir ji diya min re got, wekî kiriye-nekiriye Reşîd û Tosin nehatine malê. Berêvarê diya min û bavê min, demeka dirêj piste-pista wan bû, çi digotin nizanim?

73

- Wisane ewê min bibine ber ocaxê jî? -Saşa bi ken ji Sîsê re got.
- Tu çi dihebînî, îsko? Sîsê bi laqirdî jê pirsî.
- Ez? Ez te dihebînim Sîsê, îdî tu kesî û tu tiştî nahebînim.
- îsko, ev çend saet in em rûniştine, ka binhêre qîzik kuda çûne, şerm e! Yek kû me awha tenê bibîne, emê bibine sosret. Saşa rabû, dor-beran nihêrî. Hasmîk û

Têlî ber-pêşên wan tijî pincar û kulîlk, ber ve wan dihatin. Hela sinifa nehan de Sîsê û Saşa hevdu hiz dikirin û dixwastin kû bi hev re kêmxeberdin, kes vê halê wan fem neke. Eva yeka her zêde dihate kifşê, ne kû aza bi hev re xeber didan. Xwe bi xwe jî nizanibûn wê xwe bi çi tehrî biparêzin. Rastî ew bû, wekî herdu ciwanan jî xwe digirt û pey sebebê zêde xeberdanê nedigeriyan. Oersdarên dibistanê hemûyan jî hevhezkirina Sîsê û Saşa zanibûn. Mamostê ziman û edebiyata ûrisî Evêlîna Rubênovnayê, bi taybetî ji mamostan re goti bû, kû ji bo hevhezkirina Saşa û Sîsê de xeberdana zêde nekin. Wê hewce dîtibû kû bi mamostên din re xeberde, ber kû berî heftekê, dema laboratûwarê li pey hevalan mabû û bi hev re xeberdabûn mamostê kîmyayê Aleksan Mikritçiyân bi neheqî Saşa û Sîsê re hêrsa xwe hanîbû. Ev yeka bi hemû teleban xweş nehatibû û pey laboratûwarê ji Evêlîna Rubênovnayê re gotibûn. Saşa û Sîsê, kela dilên xwe yê gur nedinhêrîn, ji hevalan paş nediman, rind hîn dibûn û dersên kû mamostayên wan dane, cî bi cî û di waxtê de diqedandin. Wan çaxa di nav ulmê pedagojîyê de derheqê evîntiya qîz û xortên teleban de, dîtînen cure bi cure hebûn. Rûmet didane wan dîtînan kû, di dibistanan de

74

nedihîştin kes bi van tiştan mijûlbe, telebe gere tenê hîn bibin. Eve pirsê wane serekebû. Pirsê gîhîşte wê derecê, wekî di dibistanê de qîz û kur ji hev qetandin. Lê Evêlîna Rubênovnayê ev dîtînan şaş û nepedagojîk didît.

Waxta kû ev pirsên pedagojîk hatin munaqaşa kirinê,  
ew bi hişkî li ser fikra xwe mabû, nerastiya vê  
berbirîbûnê wisa xeberdabû, wekî tu kesî nikaribûye li  
hemberî gotinên wê tişteki din bêje. Lema jî di nav  
hevalên mamosteyan de qedrê wê gelekî bilind bû û  
pey vê eşaretê tu kesî tişteki negotibû.

Evêlîna Rubênovna di plana xwe ya terbiyekirinê de  
kifşkiribû û çarêkekê tevî telebên sinifên bilind, êvaran  
"werin em bi dilvekirî qise bikin" derbaz dikir. Bi vî  
tehrî, êvarên wisa gelekî bi dilê qîz û xortên gihîşûbûn.  
Wan de dersdara ceribandî qewlê wisa çêdikir, wekî  
qîz û xortan ji hev şerm nedikirin, aza difikirîn,  
derheqê hesînê dilê xwe ya herî zirav de xeberdidan, ji  
dersdara xwe ya hezkiyê bersiva xwe ya baş distandin.  
Hema pey êvareke wisa ye hewaskar, ewê bi Sîsê re  
tenê qisekiribû. Ji ber kû mesela Sîsê û Saşa de, ya here  
bi zehmet pirsarî miletiyêbû. Evêlîna Rubênovna bi fe5al  
û aqil anî nêzîkî wê yekê dibû, tay beû zanibû, wekî di  
nav miletê Kurmanc de edetên miletiyên hişkin, helkirina  
meselên wisa gelek zehmetin û bi destê merivekî  
nayê sêrî. Ewê zef rind zanibû, wekî dê û bavê Sîsê merivine  
xirab nînin, kêmasî, qusûr di Saşa de nedidîtin,  
hela serda ew xort hizdikirin, lê ji dîtina xelqê ditirsiyan.  
Ewê zanibû, wekî Mêrgesorê de çûk û mezinan  
Saşa jî, Sîsê jî hizdikirin, xênjî ji çend xortan, kû çavên  
wan di Sîsê de bûn. Fikra gişkan, bawer bikî yek bû,  
wekî ew herdu ciwan layîqî hevin. Lema jî Evêlîna  
Rubênovnaê ji bo safîkirina vê meselê merinên gunde

qedirgir kiribûn vê mabêynê, kû bikaribin tesîr li ser dê  
û bavê Sîsê bikin.

Dibistan kutakirina wan nenihêrî, lê Saşa jî, Sîsê jî nikaribûn  
ji Evêlîna Rubênovnaê biqetiyar. Wê bi xwe ji  
wan re gotibû, wekî mesela qedera wan de tu tişo bê  
wê nekin. Derheqê xebardana Reşîd û Tosin bi bavê  
Sîsê re, Saşa bi xwe Evêlîna Rubênovnaê re qisekiribû.  
Ew bi dil şa bûbû, wekî xebardana wê û bavê Sîsê,  
şêwra wê û Reşîd berê xwe baş didin. Wê texmîn dikir,  
wekî wextê yekî mîna Reşîd ketiye vê navberê, pirsê bê  
helkirinê. Wê bi Saşa re gotibû kû pey vê xebardana,  
Karê bira çend mêrên gund hilde, herin xwazgîniyê  
Sîsê, bi erf-edetên dinê wê bixwazin, nîşan bikin.  
Efo u Jlna wî -Fatê merivnên rûnêrm, qedirgir û  
cînarine qencin. Taybeo Fatê jineke bi hemdê xwe, kûr  
û dûrbû. Ew mînanî jineka mêranîbû. Wê serkariya  
malê dikir. Tivdarek, şuxul-emelê malê bi de, stê wê  
dihate kirinê. Malxwetiya malê di destê wê de bû, lê  
qedrê mêrê xwe hertim bilind digirt. Pirs kû pêş de dihatin,  
di pêş mêvanan an jî der û cînar an ewê dida  
kifşê, wekî bê malxwê malê nikare bike, lê ya rastî wê  
qerar dida kû wê bi çi tehrî meselê safî bikin û her tim  
jî ew di qirarên xwe de rast derdiket. Di gund de qedrê  
wê jina aqil bilind digirtin. Efo salên dirêj heywanên  
kolxozê gund xweyî dikir, seroktiya kolxozê qedrê wî  
digirt û ji xebata wî kêfxweşbûn. Ew meriya bê şêwr û  
pirskirina helala xwe tu tişt nedikir. Mêr û jinê herdu

qîzên xwe û kurê xwe rind terbiye dikirin. Sîsê bi xisyet, aqil û sîrafetê xwe ve li dê çûbû, lê bi bejn-bala 76

xwe, bedewiya xwe mîna xalê xwe bû, kû di bajêr da dijît û dixebiô û di nav gişkan de gelekî ji Sîsê hizdikir. , Sîsê çi çaxî hate hundir odê, wextê dê û bavê wê rûniştibûn, şewra xwe dikirin. Sîsê kû hat, wan dengê xwe birîn, zûr bûn li wê nihêrîn. Wê texmîn kir wekî di derheqê wê de xeber didin.

Dê jê pirsî:

- Sîsê lawo, hela rûne, gilyê min heye, ji te re bêjim, - Fatê got û cî nîşandayê. Ewê zanibî diya wê yê çi bipirse. Efoyê bavê wê bi hêdîka rabû, ji odê derket. Wî zanibî, wekî Sîsê derheqê wan gilyan de ber wî xebernade.

- Tu îdî gîhîştîyî, xwendiyî, dixwezim pirsekê bi te bişewirim, qe tu li ser çi fikirêyî? -Fatê got û li çavên qîzê nihêrî. Sîsê serê xwe kiribû ber xwe, ker guhdariya dê dikir.

- Kara diya îskender xeber şandiye, wê sibê bên xwezgîniyê te... Ji gundê Şênîkê Zurbe jî xeber ji bavê te re şandiye, ji Çilkaniyê Çoloyê Xudo eva çend care merivên xwe dişîne. Navê gişkan nikarim bidime rêzê, tu bi xwe rind zanî; ez û bavê teyî feqîr di nav du keviran de mane, nizanin çi bikin ...

Sîsê serê xwe ber xwe dernexist, cesaret nedikir kû ya rasê ji dê re bêje, nenihêrî wê yekê, bi xwe jî zef rind zanibû, wekî dê jî, bav jî ha ji evîn tiya wê û îskender hene, lê çima dê pirsê ha jê dipirse? Gelo ewê û bavê

wê berî vê hingê çî qîrar dane, gelo dîsa li ser dîtina xwe ya berê ne, wekî îskender ne Kurmanc e? Lê gotina Evêlîna Rubênovnaê û apê Reşîd? Ev û gelek pirsên dinê, wê demê dilê Sîsê diêşandin, kela wê tije bûbû, nizanibû bersiva diya xwe çawa bide.

- Dayê, -Sîsê di ber xwe de xeber da, -eger hûn ji min 77

zivêr bûne, we çawa qîrar daye wisa jî bikin, -got û kela giriyê xwe negirt, hûn çima xwe jî, min jî ciyê badilhewa dizêrînin? Ewên ji gundên din tên ji bo xwezgîniyê, kîne, ez ne wan, ne jî xortên wan nas nakim. Çima ez bi xwe dewar nînim, min bigrin-bi dine merivên nenas? Sîsê di derheqê îskender de, tu tişt negot. Wê zanibû, wekî dê hay ji .dilketina wê û Saşa heye û çend caran, wextê dê derheqê vê yekê pê re xeber dabû, gotibû, wekî xort xortekî başe, lê tenê ewe xirab, ewî ne Kurmanc e. Rast e, wê çaxê ewê dîsa bersiva diya xwe nedabû, lê bawerbû, wekî dê zef rind texmîn kiribû, ew ser çî dîtîniyê. Di pey vê gotina Sîsê, Fatê jî ber xwe ket, kela dilê wê rabû, di ber dilê qîzê de hat:

- Çima wisa dibêjî, qîza min, xwe em bê dilê te nakin, lema jî niha bi te dişewirim. Em zanin, Sîsê can, wekî dilê te û îskender hevda heye, lê yên dinê jî, kû tene xwezgîniyê, merivnên xirab nînin, xortên wan jî xortne başin. Eger ji îskender baştir nîbin, ji wî xirabtir jî nînin. Bavê teyî feqîr qurifiye, bi serhev de hatiye, nizane çî bike. Wê rojê Reşîd û Tosinê cînarê me bi

bavê te re dûr-dirêj xeberdane, rojekê di pey vê xeberdanê dersdara te -Evêlîna Rubênovna jî hate mala me, min û wê gelekî qisekir. Xwedê mirazê Reşîd û Tosin bi kurê wan bike, merivê qenc-qenc e, hingê bi bavê te re xeberdane, hewe kî bîhnfire bûye ... Evêlînaê jî, mirazê wê bi zarê wê bibe, gelekî pesnê te û îskender dida. Ev edetên me, Xwedê kambax bike, hebekî xuşûşiyê dike dilê me, niha çi qusûra îskender heye? Di pey vê gotinê, Sîsê zû'r bû li çavên dê nihêrî. Ew şabû, wekî di dawiyê de dê û bavê wê hatine ser qirarê rast. Ewê dê hemêzkir. Bi kela şabûnê û hizkirinê di

78  
dilê wê de cî nebûn, xêleke dirêj herdu milê xwe ji stuyê dê bernedida ...

- Dayê, -Sîsê dê ji hemêza xwe berneda, jê pirsî, -tu dixwazî qîza te bextewar be? Fatê ji hemêza qîzê derket, bi herdu destan serê wê girt, li çavên wê nihêrî, got:

- Ew çi pirse tu ji min dipirsî? -Çima tu şikberî? - Vê carê ewê qîz hemêzkir, -Çima tu tê dernaxî di nav zaran giştan de em zeftir ji te hizdikin? Wisa nebêje, qîza min, bira bi dilê tebe, tu çawa dixwazî emê wisa jî bikin.

- Dayê, -Sîsê di hemêza dê de got û xêleke xurt kerr bû.

- Bêje lawo, dilê xwe li ber min veke, şerm neke, lê wekî yên dilê xwe ji diya xwe re nebêjî, tê ji kê re bêjî?

- Rûyê min di bin piyên te, dayê, lê ez îdî ber van

gote-gotan, hatin-çûyina xwezgîniyan, yên kû di navberê de diçin-tên aciz dibim, vî şuxulî avakîxin, em ji nav dev-diranan derkevin!

- Tu rast dibêjî, qîza min. Bavê te ê va bê, ezê jê re bêjim, bira here bi Şêx Sefo jî bişêwire. Va Karê xeber şandiye, yê sibê bîn, lê hela heta niha tu qerarekî me tune. Pîî, Sîsê, ji bîra min çûbû kû ji te bipirsim. Min bîhîstiyê kû diya îskenderê ûris sax e, nivîsiye, wekî dixwaze bê vir, raste? -Fatê got û li çavên Sîsê nihêrî. - Eger eva yeka rast be, ew bê, îskender jî bide pey diya xwe ya helal here, wê çawa be? Tu qet derheqê vê yekê de fikirîyî?

Sîsê metelmayî li dê nihêrî. Raste, ewê û Saşa derheqê gelek tiştan xeber dabûn, lê Saşa carekê tenê jê re gotibû, wekî diya wî ya helal heye, dixwaze bê wî bibîne.

79

- Erê, dayê, diya îskender ya helal heye, dixwaze bê, wî bibîne, lê ez bawer nakin kû Saşa bide pey wê here ...

Saşa derheqê mektûbên diya xwe, taybetî jî ya dawîn, bi Sîsê re xeberdabû. Sîsê, di vê xeberdanê de texmîn kiribû kû Saşa çiqasî ber xwe dikeve, ketiye di halekî çiqas bi zehmet. Ewê ne xwestibû ji wî bipirse, eger diya wî bixwaze wê bi diya xwe re here? Lê ji xeberdana wî tê derxistibû kû ewê neçe, ji bo kû bê hesab ji Karê hizdike, wêya diya xwena helal zane.

- Sîsê, tu ku zanî wê yekê, ewî di derheqê vê yekê bi



xwe ji te re got, an hema wisa, tu bi texmîna xwe dibêjî? -Fatê ji qîzê pirsî û li hîviya bersiva wê sekinî.

- Dayê, ji te venaşêrim, -Sîsê di ber xwe de got, -Saşa bi xwe ji min re got.

- Rast e kû diya wî mêr kiriye?

- Rast e, inê, qîzeke wê jî heye.

- Ewê por kurê bi çi dilî jî mêr kiriye, di ser xortekî mina îskender? Lê mêrê wê, bavê îskender, ew heye an na?

- Na! Saşa ji min re tu zanî çi got, dayê?

- Çi?

- Diya.wî nivîsiye kû mêrê wê li Ûkranîyê şer kiriye, wekî ewî û Cemalê mêrê Karê bi tev şer kirine û di qebrekî de hatine gor kirinê.

- Cemal û mêrê wê li ku hev naskirine? - Fatê metelmayî ji qîzê pirsî. -Na Sîsê, ez bawer nakim! Lê, kê

zane, jiyane, şere, hertişt dibe ... Hela bise, -Fatê qey bêjî nû va ser hise-hisa ket, hebekî bi hêrs, hebekî jî bi laqirdî li ser qîzê vegeriya, -ew tu û Saşa li kêderê û kingê rastî hev tîn, wekî awqas tişt zanî, ha? Sîsê bi sûcdar li çavên dê nihêrî, lê kû texmîn kir dê di bin

80

bêfilan de dikene, hebekî ruhber bû, herdu sûretê wê sor bûn û got:

- Saşa ev giliyan zû de ji min re gotibûn, dayê, hela wî çaxî, waxtê Evêlîna Rubênovnaê em gazî kiribûne dibistanê

...

- Lalawo, hizkirin, hizkirin, lê hebekî xwe bi edeb

xweyî bike, hezar dost-dijminê me hene, gunde, wekî yên bajarî neke! Wisa bike kû em di nav xelqê de nebine sosret. Wisa jî gund hemû ha jê heye geveze û virekên gund nizanî, ew hema bi hîviya tiştên awthane kû mûkî têkin hûkî.

- Dayê Xwedê neke min çima tişteki xirab kiriye, wekî di rûyê min de... -Xwest bêje bênamûsî tê li ser mala me, lê xwe girt, kela wê tije bû. Dê ber dilê wê de hat:

- Na, qîza min, şikir hela heta niha kes nikare bêje kû eva kêmasiya mala Efoyê Mistêye, çima wisa difikirî? Gotina min ewe, wekî Xwedê neke em bibin benîştê devê xelqê ...Bext û qedera me bi me re ye, tu nabînî çî dibe? Lê ji bextê me nîne, xortekî awaha delal rastî me hatiye, ew jî heyf? -Fatê kurt sekinî li qîzê nihêrî, texmîn kir, wekî ew li tevhev bû. Sîsê ew kû bihîst, li çavên dê nihêrî. Dê zû ber dilê wê de hat:

- Na lalawo, nexeyîde, wekî em dibêjin heyf kû îskoyî ûris e. Ne, ew qusûra wî nîne!. Lê tu ware binhêre ev bêxweyê edetên miletiyê ... Ji kê re dibêjî û kê bihîstiye, gişt jî îskender hizdikin, lê dawiyê de dîsa heyfa xwe tînin. Ez ji bo wê yekê ji te re dibêjim, wekî ha ji xwe . hebî, lez nekî. Va bavê te îro hatibû, tûfe-tûfa wî bû, çûbû mala Şêx Sefo, jê re gotibû, wekî hal-hewal eve; Karê yê bê xwezgîniyê Sîsê, dixwaze ew jî di navdabe, lê ewî qebûl nekiribû, gotibû kû ez nakevim nav tiştên

81

awha. Lema, qîza min, dibêjim lez neke, wê sibê bên,

emê jî gazî qewm-pismamên xwe bikin, ka Xwedê çi dike? Rast gotine, qîza min:

"Bûke li hespê ye, hevsarî li Mistê ye,

Kes nizane qîsmetê kê ye."

Ji vê gotina dê têderxist kû kar ji texmîna wê gelekî diware. Dilê wê diêşiya, qey bêjî yekî ew kiribû nav destê xwe û hêdî-hêdî digivaşt. Ew li ber xwe diket, ne awqas ji bo wê yekê kû Saşaê wêyî hizkirî kare ji destê wê here, bext-mirazê wanê neyê sêrî, lê bo wê yekê kû merî wisa bûne qûl-bendeyê edetan. Ewê zanibû, wekî diya wê jî, lo hela mêrên gunde qedirbilind jî rast difikirin, Saşa hizdikin, lê ew jî, çawa tê kivşê, ber dîn û edetan bêtaqet dibin. Sîsê demeke xurt ker difikirî nizanibû çi bêje, çi qirar bide. Bêje dê kû îznê dide wan, destê wê bigrin û mîna dewarekê, kê dixwaze bidinê, an jî li hemberî wan derkeve, wan şîkat bike, bêje wan, wekî wê serê xwe hilde, ji van deran here, naxwaze mêr bike. Lê şerm kirina wê îzin nedida.

- Ser tiştêkî kû awqas xeberdan bû, wê çi ji wî tiştî derkeve, Sîsê serê wê di ber de bû û bi keder gote dê, xwest rabe, here, dê bi milê wê girt, di ber dilê wê de hat:

- Sîsê ez qurban, li ber xwe nekeve, em dixwezin kû her tişt bira başbe, xeberdana zêde tunebe, him jî...

- Dayê, ha nabe, dewsa kû em di mala xwe de şêwra xwe bikin, bêne ser qirarekî, lê tu fi bavê min her roj bi meriyan re şêwrê dikin, her yek tiştêkî dibêje, dîtinên merivên cure-cure hûn dewsa rûnê helandî hildidin,

lema jî nikarin bêne ser qirarekî, him xwe, him jî min  
dizêrînin ...Ha nabe dayê!...

Fatê di gotina qîzê de rastî û heqî didît, lê nedixwest  
82

kû xwe ber wê bişkêne, xwest Sîsê bide bawerkirinê,  
qirar dayîna bext-mirazan meseleka hêsa nîne, gotî deh  
caran li ser bisekinin, paşê carekê bibirin. Lê kela Sîsê  
tije bûbû, îdî guh nedida xeberdana diya xwe, xwest  
rabe-here, lê hema wê demê dengê derî hat û bavê wê  
medekirî hate hundur ...

"" "" ""

Wedekî dirêj Sîsê di nav cî-nivîna de vediqeliçî, nikaribû  
razê. Ji xeberdana dê, ber xwe ketina bavê  
têderdixist, wekî ew li ber meseleka bi zehmetin, nizanin  
çawa bikin. Ewê xeberdana diya xwe û bavê xwe  
dibîhîst; ew jî ranezabûn û zanibû, wekî derheqê wê û  
Saşa xeber didin. Çi digotin, çi qirar didan, ewê rind  
nedibîhîst, her tenê wextê wan ronkaya elektrîkê  
vêsandin, rabûn, wê îskîniya diya xwe bihîst ...

Sîsê bi xeysetê xwe ve yeke bi hemdê xwe, bi sebir  
bû, gura dê û bavê de bû, jîr bû. Ji hezar tiştî tiştekan hizdikir;  
lê wexta kû hizdikir bi hemû dilê xwe ve hizdikir.

Ew bi guhdar, bi zên û zîrekbû, di pey şuxul-emelê  
malê timê pirtûk di dest de, quncikê odê de rûdinişt,  
dixwend, bi seetan ji ciyê xwe ranedibû. Di dibistanê  
de hemû dersdar, taybetî jî dersdara ziman û edebiyata  
ûrisî -Evêlîanaê, rind zanibû, kû hezkirina wê ber bi  
edebiyatê û zimane, ji bo wê yekê jî gelek pê mijûl

dibû. Sîsê di dibistanê de di nav hevalên xwe de aktîf bû, giştan ew hizdikirin. Caran di malê de, fikrên wê û dê an jî yê bavê wê hevdu nedigirtin. Wan deman de wê bi hemdê xwe, vekirî, dîtinên xwe bi dê û bavê xwe re şilovedikir. Wan bi qîza xwe bawer dikir, lê di dawiyê de wisa didane xuyanê kû qîza wan Kurmanc e, gere

83  
qedir û qîmetê edetê xwe yê miletiyê bigre. Sîsê kû awha bi aqilanî şilovedikir û dixwest edetên miletiyê goreyî jiyana nû û vê dewra nû bike, zanibû kû tenê bi vî tehrî dikare dê û bavê xwe bide bawerkirinê, wisa nebe, nabe. Çawa kû rojî girtin ji bo meriyên nexweş, tenê zerarê dide wan, sihetê meriya xirab dike, meriv dikare dîsa eyd-erefatên xwe bike. Pêşiyê de dê û bavê wê heq didane wê lê dîsa jî ji dîtinên xwe derbaz nedibûn

Zivistanekê, roja eyda Xidir Nebî, wextê Sîsê û diya xwe sibê şefeqê text vekirin, wê ji diya xwe re got:

- Dayê, tu zanî, di nav edetên meyî miletiyê de giştan zeftir çi bi min xweş tê? -Fatê şuxul dikir û guhê wê li ser xeberdana Sîsê bû.

- A, wekî, roja eydê gundî hemû diçine malên hev, eyda hev pîroz dikin. Yê kû bi hev re nexwaşbin jî wê rojê hevdu tên. Tu zanî ev tişteki çiqas rinde? Paşê, waxtê kû yek dimre, gund hemû şînê dikin, hewariyê mala mirî dibine mala xwe, wextê dewatan jî gund gişk şadibe, mêvanan di nav hev de belav dikin. Tişteki kûr û mezin di nav bûyeran de heye. Ez awqas

pirtûkên nivîskarên cur bi cur miletan dixwînim, tu rastî edetên awha nehatime ... -Sîsê nihêrî dê guhdar xeberdana wê dibe, her ruhdar dibe, dixwaze xeberdana xwe dûmayî bike, lê dê ber giliyê wê de tê:

- Tu rastî, qîza min, te rast texmîn kiriye, lê çî bi te xweş nayê?

- Heyf, dayê can, li rex tiştên ha yê rind, yê xirab jî hene. Besa xeberê, qelendê qîzan. Ew tişteki sosretiyê, dê û bavê qîzê û xort rûdinin, bazarê dîkin, qey bêjî dewar an jî tişteki din dikirin, difroşin. Tiştên bi vî tehrî dîsa hene, çîma hûn nizanin?

84

- Tu rastî, qîza min, ne tişteki başe, lê pêşiyên pêşiyên me, belkî ew ... -Fatê navbirî da giliyê xwe, nexwest li ber qîzê gilyê nebaş bêje, lê ha got: - Em çawa bikin, edetên me yê miletiyêye, gişt çawa, em jî wisa.

- Ez ji edetên me hizdikim, dayê, lê wî edetî, yê kû kar-feyde bide meriyan.

- Çiye, tu dixwazî her tişt ji mala me derê? Ez zanim tu çî dixwazî bêjî.

Wê demê Sîsê ji kûraya dil ber xwe ket, wekî diya wê, wê rast fem nake, ew hew zane kû Sîsê dixwaze bira wê bê qelend bidine mêr. Di pey vê yekê, dê û qîz hebekî bi xeyd ker-lal şuxulê xwe ve mijûl bûn.

Sîsê di pey vê xeberdanê, nîfir ji bextê xwe re dikir, ber xwe diket kû çîma qedera wê awha bi Saşa re hatiye girêdanê. Paşê xwe bi xwe di ber dilê xwe de hat; çîma qedera wê çî xerabe, xortekî mîna Saşa para

wê ketiye. Wê ji kûraya dil Saşa hizdikir. Raste, li ba wî awqas xwe bernedida, lê gelek caran nikaribû hesiya hizkirina xwe bigre, dilê xwe li ber wî vedikir, lê ji hudûdê kivşkirî derbaz nedibû. Saşa jî hindawa xwe de nedixwest tiştêkî ji Sîsê veşêre-derheqa hizkirina xweye ewlîn de wisa bi aqil û kîbar şilovedikir, wekî kela dilê Sîsê tije dibû, bêhemdî xwe serê xwe datanî ser sîngê Saşa û tema wê dema şîrînkûraya ruhê wê de fûrdida. Raste, herdu dilên ciwan texmîn dikirin çi hasêgeh li pêşiya wan sekiniye, lê şêwr-şîretên dersdara wane hizkirî, der û cînanan, heval û hogiran guman dida ber dilên wan. Herdu ciwanan zanibûn, bûyer li hemberî xwestinên wan pêş de diçin.

85

Sîsê sibê zû rabû, mîna hercar ew der dane hev, ber derî zû-zû gêzî kir, paşê herdu elbên avê hildan, çû ji kaniyê avê bîne. Hema li ser kaniyê ew û Karê rastî hev hatin. Karê kû Sîsê dibîne, dibe zîvîna wê, Sîsê hemêzdike, herdu sûretên wê radimûse û dibêje:

- Ezîza min, çima wisa zû hatî avê? Pîî, la ez mirê, te çima wisa reng havîtiye, tu nexweş nînî, çi bûye Sîsê?
- Tu tişt nebûye, meta Karê, êvarê serê min hebekî diêşiya, ez ranezam, -Sîsê got û serê xwe kire ber xwe.
- Him bêkêfi, him jî hawqa zû rabûyî û hatî avê? Emê îro êvarê bîn malê, qîza min, -Karê gotina xwe ne qedand, dîsa Sîsê hemêz kir, pê şa bû. Lê Sîsê tenê dikaribû kela dilê xwe bigre, kû negrî. Lêlêbû ji Karê re bêje, wekî pake kû neyên, dê û bavê wê fikra xwe guhas

tine, naxwaze, wekî ew bêrûmet bibin. Karê  
texmîn kir, kû Sîsê bi tehrekiye, tişteki di bin zimanê wê  
de heye, lê naxwaze bêje.

- Sîsê, çi bûye, ji min re rast bêje, ji min veneşêre. -  
Dilê Sîsê mîna teyrekî birîndar, sîngê wê de difirfitî, nizanibû  
çi bersiva Karê bide. Jê re rast-rast bêje kû dê û  
bavê wê hê nehatine li ser qerarekî, wekî Sefoyê şêx  
naxwaze bikeve navbera vê meselê. Ewê serê xwe  
kiribû ber xwe, ker sekinîbû, alava germ sûretê wêyî  
spîçilokî hilgeryabû, rengê sor hêdî-hêdî zêde dibûn.  
Karê nihêrî ew nerihete, naxwaze dilê xwe li ber wê  
veke, got:

- Tu tişteki ji min vedişêrî, nizanîm çiyê. Naxwazî  
bêjî, nebêje, tenê hêsabe, ber xwe nekeve, zû here  
malê, palde, ha tê dest xwe herî, qîza min! Tenê Fata  
diya xwe re bêje, emê êvarê bîn, nişkêva me bê qedir  
rêvanekin, şerme, di nav xelqê de... Gilî hela di devê  
Karê de bû, Sîsê herdu elbên tijî hildan zû jê dûrket û  
86

azayî da hêsirên xwe. Çend gavan çû, elb danîn, destmala  
xwe derxist, bi avê şilkir, pê ser-çevên xwe paqîş  
kir, wekî ji der-cînanan kes giriyên wê texmîn neke.  
Karê pey awqas derd û kulan, pey rojên jiyana xwe  
yên bi zehmet tu cara waha dilteng nebûbû, waha ber  
xwe neketibû, çawa kû wê êvarê, waxta kû ji mala  
Efoyê Mistê bêqedir vegeriya. Sîsê lema vêsibê wisa  
medekirîbû, -Karê bi xwe xwe difikirî, -qet nebûya ji  
min re bigota, em ha ji xwe bibûna û di nav gund de



nebûna sosret? "Karê digot û bi xwe de dibiliya. Ewê ciyê xwe rihet nedidît. Di nav malê de diçû û dihat. Saşa di nav ciya de medekirî, hîşyar difikirî. Wê sibê saet îdî deha derbas bûbû, lê ew ji cî ranedibû. Karê demekê rûnişt, kûr li wî nihêrî, paşê got:

- Rabe lawo, rabe, rast gotine -roja xweş sibê de xweş e... Ber xwe nekeve, Xwedê bi rehme, kurê min, ewê xwe bi xwe poşman bibin, çima ji bo te qîz tunenin? Tu kû dil bikî hezar hebê bên destê te ramûsin!

- Dayê careka din wisa nebêje, Sîsê di vî karî de gunekar nîne, ew dê û bavê wê ne kû cesaret nakin piyê xwe bavêjin vî aliyê şemikê.

Hema wê demê derî vebû, Hasmîk, Têlî û Têmûr hatine hundur.

- Sibe li we xêr -hersêkan bi hev re silav dan.

- Pey, hela razayiye? -Tîrriûr got û ber bi ciyê Saşa çû, lê herdu qîzikan şerma xwe dane alîkî, li kêleka Karê rûniştin.

- Hûn bi ser çevên min re hatine, -Karê got, beşera

87

wê hebekî xweş bû. Pêra-pêra texmîn kir kû ew îdî ha ji bûyerê hene, xwest tişteki bipirse, lê Têmûr ber giliyê wê de hat, berbirî Saşa bû.

- Zû rabe, em herin, şuxulê me bi te heye. Herdu qîzikan jî bi ser giliyê Têmûr zêde kirin:- Erê, erê zû rabe!

Karê metelmayî li wan dinhêrî, nizanibû çî bêje. Ji

rengên wan texmîn fikir kû ew hatine û lezbûna wan bi karekî girîng ve girêdayîye, lê nizanibû çiyê. Heta Karê ha difikirî. Saşa îdî kincên xwe li xwe kiribû û hazir sekinîbû.

- Têlî, Hasmîk ew çî bûye, hûn Saşa bi ku de dibin? Têmûr çî bûye?

- Meta Karê, netirse, tiştê nebûye. Em diçin mala me, em bi tev taştê bixwin, bêsebir nebe, emê zû bîn. - Têmûr got û derket derva, lê Saşa xwe para girt, veqerîya ser dê:

- Dayê, ezê zûtirkê bêm, ji te re hertiştî bêjim.

Ew kû çûn, Karê hahanga kincên xwe guhast, derket derva. Saşa, heval, hogirên wî nedihatî xuyanê. Karê vî alî, wî alî nihêrî, Geveza jina Tosin, qeynter li ser milan ji ser kaniyê vedigerîya. Ew nêzîkî Karê bû, barê xwe danî û got:

- Lo çevên min korbûyê, Fatê û Efo çima wisa li serê te kirin? Tosin şev hat malê, ji min re yek-kek got, digot û dibiliya, hêrsa xwe radikir. Çima ewê qîza xwe bidine yekî ji îsko baştir? La Xwedê qebûl nekirê!..

Ber xwe nekeve, Karê, xwenga min, ewên xwe bi xwe poşman bibin. Paşê jî ew qîz û xortin, wan herduya hev hizkiriye, -Gevezê digot û rê nedida Karê xeberde, -kê çî dixwaze bira bêje. Pîî, Karê min bîrker kû ji te re bêjim, hêja jinên li ser kaniyê digotin. Wekî Sîsê ji malê

88  
xeyîdiye, çûye mala Têliya hevala xwe. Karê kû ev bihîst, çav lê fireh bûn, nizanibû çî Gevezê re bigota.

- Gevez, kê got, raste? - Lê hîviya bersiva Gevezê nesekinî, lezande malê. Xwe bi xwe jî nizanibû çî bike.

Saşa hela venegeriyabû. Ewê îdî zanibû Têmûr, Hasmîk û Têlî çîma hatibûne pey wî. Hezar fikir di sêrî de derbaz dibûn. "Nişkêva ciwantîkê nekin, me di nav gund de... "

Karê ciyê xwe nedidît, nizanibû çî bike. Rabe here mala Eyşa diya Têliyê, hela binhêre ev çî kare? Na, xwe bi xwe re got, ya rind eve kû tevî tişteki nebe. Saşa kêmaqil nîne, wê bê, her tiştî jê re bêje. Ewe tevhevbûyî ha derkete ber derî, ha dihate hundur, demekê rûdinişt û dîsa radibû. Destên wê tişteki nedigirt. Nişkêva dengê Cemedî jîna Mîro hate guhê wê, jî ber derî gazî wê dikir.

- Karê, Karê, ca derê derva, çî hundur de rûniştîyî?  
Karê hahanga derket derva.

- Ev wexta teya rûniştinê ye? Çevên te bi ronayî, îsko û Sîsê çûne gîhîştine hev, tê mizgîniya min çî bidî?

- Pîî, la porê min kur kurê, tu çî dibêjî? Çawa gîhîştine hev? Cemê, bextê kurê teme, tu rast dibêjî? Kêderê, çawa gîhîştine hev? Lê wê çawabe, ez qet jî destê Efo û Fatê xilaz dibim?

- Efo û Fatê wê çî bikin, qîz û xortin, jî hev hizkirine, gîhîştine hev! Dinê-alem zane, kirina wan bi dilê me gişta ye. Efo bira kumê xwe ber bi ezman bavêje kû qîza wî yekî mîna îskender distîne! Cemedê digot, jî şabûna ber Karê direqisî. Lê Karê nizanibû, jî şabûnê an jî tirsan, dil cida sekinîbû, xeberdan pê nedibû.

- pîî lêlê, hela vê binhêre, dewsa kû şabe, av kiriye devê xwe sekiniye. Karê, hela binhêre, wê qîz û bûkên  
89

gund hemû hilşiyane mala Keleş û Eyşê, Fatê lezek pêş de derkete derva, kire wîşe-wîş, çokên xwe xist, nifir li qîza xwe kir, paşê çû hundur û dernekeve. Xatirceme, eva bi dilê wê bû jî, lê xwe nade kivşê. Di vê sibêda kê bîhîstiye şa dibe ... Cemedê bi xeberdana xwe rê nedida kesekî, Karê ker sekinîbû, Cemedê û ew jinên cînanan kû hatin û li dora wê berev bûbûn dinhêrî. Gevezê, Xezalê, Zerîfê û cînarên din, her yekê di hindava xwe de çavronkayî didane Karê, di ber dilê wê de dihatin: digotin wekî netirse, Efo û Fatê wê nûva çibikin, kirina ciwanan bi dilê hemûyane. Karê pêrapêra di ser xwe de hat. Jinên cînar dilminî didane ber dilê wê. Geveza jina Tosin milê Karê girt û got:

- Karê em herin hundur; rihet rûnên, bi hev bişêwirin, ka emê çi bikin. -Ev xeberdan devê wan de bû û îdî diçûne hundur, Reşid û Tosin hatin ber derê Karê. Reşid şalikeke ji postê pezî hasilkiribî ber nava toz û xubara kilsê û çîmentoyê de pey Karê kire gazî:

- Xwîşka Karê, hela viy:da, îskenderî kuye? Karê kû dengê Reşid bihîst, lez di paşda vegeriya, xwe havîte ber piyên wî, bi kelogirî got:

- Apê Reşid, bav û birê min, ez di bextê kurê te me, îskoyê min î tayê bi tenê ye, kesekî wî tune, li jor gumana min Xwedê ye, li jêr tu yî, nişkêva bûyereka nebaş neynine serê îskoyê min?

- Ez ji te dipirsim, îskoyî kuye, lê tu...  
- Dibêjin li mala Keleş. Ez ha ji pê tuneme. Ev weke du-sê saetan heye, Têliya qîza Keleş, bi du hevalan ve hatin pey, ew birin, lê ji min re tişteke negotin.  
- De pak-pak, tu çi tevhev bûyî. Qîz, xortin ... Nedixwast îdî dirêj bike, vegeriya li alê Tosin û Elîxanê şivan kû hatibû gîhîştibû wan, got:

90

- Hela em herin mala Keleş, ka binhêrin çýye, çý bûye?  
Karê û jinên cînar dua dikirin Reşid re kû her tim dikete navberiya cînaran û meselên wan hel dikir.

\* \* \*

Wê siba payîza derenge xweş hewerzeke bi tehrekî, gundê Mêrgesorê hildabû; xeberdana hemûyan îskender û Sîsê bûn. De gunde, her yekî bi curekî şilovedikir. Taxa jêrîn dereng bîhîstibûn, gotin kenehû Sîsê çûye, ser îskender de rûniştîye, hinekên din digotin, îskender ew revandiye ji bo kû dê û bavê Sîsê ew nedane. Bi kurtî, kesekî ya rastî qal nedikir.

Wextê Reşîd, Tosin û çend mêrên gund diçine mala Keleş, evê tê kû jina wî -Eyşê, yeko-yeko dibêjin çawa bûye.

"Bavo, -Keleş dibêje, -di vê sibê de Efo û Fata jina wî îdî çi bêjî ji me re negotin? Qey bêjî em gunekarin. Me bi deh caran jê re got kû hal-hewal ha bûye, dîsa dida qamê xwe! A, Reşîdê bira, ez na tu. Sîsê vê sibê berbangê, ez û xwîşka te nû rabûbûn, hate malê, pirsra

Têliya te kir. Em tirsiyan, me jê pirsî, gelo tiştekan nebûye? Got na û çû ba Têliyê. Paşê Têliyê ji me re got, wekî hûn şeva din çûne mala wî, dûrî kurê wî, mal di ser de wêran be, ka giliyê sibheta êvarê têne serhev? Gilîkî kutasî nedaye we. Sîsê jî vê sibê, kela wê tije tê ba Têliyê. Eva te jî, Xwedê awqas pê re be radibe, gazî hevalên xwe yê din dike, tîn, hevdu berev dibin, paşê diçin îskenderê kurê Karê jî tînin. Çima xwe cara ewlîn nîne waha berhev dibin? Fata te jî pê dihese, îdî dawiyê de mûkî dike hûkî, kene hû me qestbende qîza wê û

91

îskender haniye mala xwe de gîhandiye hev. Zorê navê revê ser wê xistin. Lo birao, rev çî, hal çî. Ji qîşte-qîştê Fatê gund hemû pê hesiyan, -ev qîz-bûkên gund jî, Xwedê bi mirazê wan re be, qey bêjî vê sibê pê gêziyê berhev kirin, hatine bi dora herdu ciwanan kom bûne ... A, Reşîdê bira, tu bi bextê kurê xwe, li vir çî gunekariya min heye? Keleş demekê Reşîd, der û cînarên dinê yê berhevbûyî dihêre, dîsa giliyê xwe dûmayî dike. - Lo birano, çima kê nizane, ew herdu ciwana hevdu hizdikin. Efo îdî çî xwe virda-wêda davêje?"

Reşîd kû van gotinan dibihê, ew, Tosin û Mîroyê Lezgî diçin hundur malê. Sîsê û îsko di odê de bûn, heval û hogirên wan, qîz û bûkên ciwan dora wan girtibûn, eşq û şa heryekî tiştekan digot, lê Sîsê di nav Têlî û Hasmîkê de rûniştibû, ser-çev lê sor bûbûn, serê wê di ber de digiriya. îsko û hevalên wî hebekî dûrî wan

rûniştibûn. Hemû li ber Reşîd radibine piya, lê îsko  
berbirî wî dibe, dibêje:

- Apê Reşîd, li vir rev-mev tune. Hema wisa em li vir  
rastî hev hatin, lê meta Fatê ...

- îsko rast dibêje apê Reşîd, Sîsê dixwast kû vegere  
malê, me nehîşt, bo kû meta Fatê gund bi pê da hesandinê,  
kenehû Sîsê reviyê, me jî go wekî navê revê li ser  
te xistine, îdî çima diçî, rev-rev ...

Qîzikên hevalên wê bi hev re gotin.

Reşîd vê xeberdanê dibihîze, demekê difikire, paşê  
xortên wir berhev dike, bi hev dişêwirin û qirar didin  
kû gazî Efo û jina wî bikin, li pêş çevên mixtarê gund,  
dersdara Sîsê û Saşa, dîrektorê êtîmxanê Badalyan  
bikin, Karê, Efo û Fata jina wî hema pêra pêra li hev  
bînin, meselê bi vî tehrî hel bikin.

92

Çawa qirar dabûn, wisa jî dikin. Reşîd berê ewlîn  
zar ekê dişîne pey Efo û jina wî, paşê jî yên dinê. Ew  
xêleke kurt di nav mala Keleş û Efo, wî û Fatê re xeberdide,  
paşê Karê, Gevez û jinên din tîn. Karê hebekî  
xwe paş de digirt, tirs dilê wê de hebû, tirsiya wekî Efo  
û jina wî giliyên nebaş jê re bêjin. Lê ewê kû dît Reşîd  
dûrva bi desta gazî wê dike, hebekî ruhdar dibe, ber bi  
wan diçe. Jin û xortê din dûr ve li wan dinhêrîn, bê  
sebir li hîviyê bûn, gelo Reşîdê bikaribe kela dilê dê û  
bavê Sîsê sar bike, gelo ewê bi çi tehrî Karê qebûl  
bikin?

Karê kû nêzîkî wan dibe, xwe davêje pêsîra Fatê, qûz

dibe kû lingên wê maç bike, lê Fatê nahêle. Karê dibêje wan:

- Efoyê bira, xwîşka min, Fatê ez xuliya bin piyên we me, min feqîra Xwedê gunekar nekin, ne ez, ne jî îsko gunekar nînin. Vira rev tune, ciwanin, di pey xeberdana şeva din, qey kela wan tije bûye, rastî hev hatine, çima wisa dikin, ne hûn jî xweyî kurin. Werin van keviran ji pêşa xwe valakin, nebine sebebên bext-mirazan.

- Pey hela eva serda me gunekar dike, -Efo û Fatê bi hev re dibêjin. -Reşîdê bira, lê eva tiştên kirinê ye? Qîza me birine, di mala Keleş de gîhandine kurê xwe, Keleş jî kenehû cînarê minî xêrxwaze, hela serda jî me gunekar dikin. Tu bî, Reşîd tê vê yekê qebûl bikî?

Reşîd di ber dilên mêr û jinê de tê, wana dûr dibe, demeka dirêj bi wan re xeberdide. Wexta kû ew xeberdidin, mixtarê gund Semend, dîrektorê êtîm xanê Badalyan, Evêlîna Rubênovna tên ber derê Keleş, demaka dirêj bi hev dişêwirin. Paşê Evêlîna Rubênovna û Semend diçine hundur li ba Sîsê û îskender, wan qîz û bûkên ciwan û heval û hogirên wan derdixin, tenê bi 93

wan re qise dikin. Sîsê jî, Saşa jî sond dixwin, wekî revmev tune, ne jî ev yek di fikra wan re derbaz dibe. Sîsê digrî û hîvî ji dersdara xwe dike, kû dê û bavê wê bide bawerkirinê kû tiştên wisa nekiriye, hema wisa hatiye mala hevala xwe Têliyê, lê Saşa û hevalan jî nişkêva hatine vir û hevdanîne kû kenehû ez revîme.

Vê derê Semendê mixtarê gund bi çevên xwe dibîne



û tê li ser wê fikrê, wekî raste, qîz û xort hevdu hizdikin,  
lê ew bûyera revê ne raste, herdu ciwan hatine li  
ba hev, di pey vê yekê, wextê dê û bavê Sîsê pirs  
dayîna wê nedane Karê.

Semend, Evêlîna û Badalyan gazî Reşîd, Tosin û  
Mîro dikan, bi hev dişewirin kû gazî Efo û jina wî bikin,  
wan bidin serwextkirinê, taybetî ew bi xwe jî ne li dij  
in. Pirs ew tenê ye kû Saşa bi eslê xwe ve ne Kurmanc  
e.

Eva yeka ji bo van meriyên gunde qedirbilind ne meseleka  
bi zehmet bû. Ewana, bo kû tu xuşûşiyê di dilê  
Efo û Fatê de nehêlin, Sefoyê şêx jî tînin navberê.

Wextê Şêx Sefo tê, Reşîd bi nîvlaqirdî-nîvrast dibêje:

- Berê-pêşda gotine, wekî serkanî timê ji şêx-pîra diherime.

Kekê Sefo, nexeyîde. Eger şeva dinê tu bi me  
re bihatayî, awqas tişt jî nedibû.

- Lo birayê mixtar, ev Reşîdê me, çi pêsîra min girtiye  
bernade, -Şêx Sefo bi ken ber bi Semend dibe, -min li  
vir jî.. Efo û jina wî di bin esmanekî de dijîn, çi ferq  
heye? Îskenderê kurê Karê, Xwedê mirazê dê pê bike,  
di nav me de mezin bûye, terbiye-torê me girtiye,  
hatiye li ser dîn-donê me, edetê me, îdî hûn çi dixwazin?  
Wê demê Mîro diçe Efo, Fatê û Karê jî tîne li ba  
wan.

- A, eva jî xweyê kêrê hatin, ez bi pêş wan ve bêjim, -  
94

Sefo giliyê xwe dûmayî dike, -raste, di nav ilmê Şêx Adî  
de tiştên wisa tunin, wekî ji miletê din bînine li ser

dînê me, lê ev xorta, bi qaz-qudreta yê jorîn, xwe bi xwe hatiye ser dîn-donê me, bira ne Efo, ne jî jina wî qet xu şûşiyê nebine dilê xwe, qîz-xortin, hev hizkirine, Xaliqê alemê mirazê wan bi hev bike ! Xwedê zane, Karê jî jineka wisane, heta niha kesek jê neêşiyaye ... Çima îdî jiyana herdu ciwanan û yê xwe jî pê re pûç dikin? Lê, Efoyê mirîdê min, ezê tiştêkî jî bêjim. Ev dîtina mine, zora me kesî li ser te tune, giliyê dawîn yê teye, bi aqilê xwe bike!

Mîro ku timê xweşiyê xwe bi Şêx Sefo fikir, got:

- Serê min qurbana ocaxa şêx be, walleh, merîkî ilmê Şêx Adî bi tevayî zane! -Yên li wir dikenin, lê Şêx Sefo şiva destê xwe hildibire, kenehû bi Mîroxê, -wê de here kurê ... Te dîsa berzeqtiya xwe kir.

Hema li wir, di bin dara nav mala Keleş û Efo, jinên cînar tim lê rûdiniştin, razîbûna dê û bavê qîzê hildidin û qîrar didin kû şayiya herdu ciwanan roj tira dinê bikin. Şêwr-şîretên Reşîd, Tosin, Badalyan û Evêlînayê dawiyê de Efo û jina wî tînine rê, lê giliyê Şêx Sefoyê axiriyê tesîreka mezin li ser Efo û jina wî kiribû, çawa kû dibêjin serê lodê girtibû.

- Mirîdê min, -ew dibêje Efo, - erebe kû hate ber barkirinê, gere barkin. Bi erf-edetên dinê merika hatine, dewa merivatiyê ji te kirine. Şikir qîz jî xort jî layîqî hevin, îdî çi dimîne? Dimîne li ser qerarê we! Paşê gişk ha ji pê hene, wekî qîz û xort hev hiz dikin, ez bi ocaxa xwe kim, wê bi dilê rebê min jî nîbe kû nehêlin ew herdu ciwan bigihîjine mirazê xwe. Pirseke din jî heye

Efoyê bira, -Sefo demekê fikirî, dîsa dûmayî kir, - Tu merivekî zanayî, xeber kû bela dibe, ne mîna gûzên

95

rijyayîne kû tu dîsa berhev bikî, têkî çewalê xwe. Çima çiyê tu bibî benîştê devê hemû kesî? Hi gelî maqûlno, hûn bi ocaxê kin, ez rast nabêjim?

- A, ca ez heyrana wî devî, xwe dev nîne dergê cinetê ye, dinhêrî çawa hemû tiştî dike zagûnê, -Mîro dîsa laqirdî kir. Yê li wir dîsa bi şabûn dikenin.

Reşîd dibêje:

- Efo bira, va em diçin karê xwe bikin, tu jî karê xwe bike, şuxulê îro çima bihêline sibê?

- Lo bira, karê kû Efo bike çiyê, -Keleş dibêje, - Ez û Efo mîna biran e. Rastî ewî û xwîşka Fatê vê sibê hebekî ser qûşê re kirin, lê ez ji wan naxeyidim. Sîsê hatiye mala min, bira ji mala min jî siyar bikin.

- Ferq nake, ew îdî şuxulê te û Efo ye, -Reşîd dibêje û pey vê yekê ji hev bela dibin. Ev qirara kû li ber guhên qîz û bûkan ket, li ber derê Keleş bi şabûnê bû qûjîniya gişkan. Pêra-pêra govend girtin, stran û reqisîn. Lê Karê ji şabûna tu qey bêjî firiya hat gihîşte malê. Pêrapêra gazî Mihê qesab kir kû dewara ji bo deweta îsko kokkirî serjêke. Der-cînara bû haye-hay, hemû berhev bûn, alîkarî kirin, tivdarekê wê dîtin ...

.....

Di gundê Mêrgesorê de gelek şayî bûbûn, lê şaya mîna ya îskender û Sîsê tu yekî nekiribû, her tişt bi carekê de hate sêrî, ji bo kû ev bi dilê hemû gundiyan

bû. Di vê şayiyê de gelek edetên miletîyê wê de danîn -  
topayî bela nekirin mîna şayiyên din, bi taybetî gazî tu  
kesî nekirin, lê çûk-mezinên gund di vê dewetê de  
hazîrbûn. Hemû jî bi pêşkêş û kulîlkan ve hatibûn.  
Mîna dewetên din gazîkirina bi topayî tunebû, -kê  
96

dihat, diçû li ba Sîsê û Saşa kû di odeka piçûk de  
rûniştibûn, herdu ciwan radimûsan, pêş kêşa hanî û  
kulîlk li ba dihîştin, derdiketin ber derî, yên kû diketin  
govendê dilîstin, yên kû rûdiniştin li govendê mêze dikirin.  
Di mala Keleş de, hevalên Sîsê ew wisa xemilandibûn,  
wekî rengê wêyî bedew, kincên miletîyêye  
awaz-awazî bi hev re ketibûne mercê. îsko şal-çakêtê  
nû li xwe kiribû, xort û qîzên gund xaziliya xwe wî û  
bejn-bala wî dihanîn.

Wax tê diçin kû Sîsê ji mala Keleş bînin, Reşîd, kû  
hemû serkariya dewetê hildabû destê xwe, dibêje, gere  
Sîsê û îsko berê ewlîn bibine mala bavê wê, paşê ji wir  
bînin. Fata dê û Efo di ber derê xwe textê xwarinê vekiribûn.

Wan qîza xwe û zavê xwe, bejn-bala wane  
bedew, şabûn û eşqa li dor wan dinhêrîn, ji şabûna  
xwe negirtin, hêsir tije çevên wan bûbûn. Sîsê û Karê  
diçine hundur, îsko jî li pey wan. Sîsê wedekî dirêj ji  
hemêza dê dernediket, kela xwe nedigirt. Karê di ber  
dilê wê û dê de dihat û digot:

- Çima we wisa dilşewat hev hemêzkiriye, qey bêjî  
Sîsê diçe welatekî din. Va em bi rex hevin, emê mîna  
malekê bin, Fata xwişk. Nehêle Sîsê bigrî, rengê wêyî

delal wê biçilmise ...

Dema paşîn Sîsê xwe havîte hemêza bavê xwe, ew bi sîngê xwe ve givaşt, sûretê wî yê zivir ramûsa.

Hemû jin û meren gund û qîz û xortên ciwan hatibûne ser xwarina deweta Sîsê û îskender. Di oda mezin de mêr rûniştibûn. Tenê ji jinan Evêlîna

97

Rubênovna dersdar û terbiyedarên êtîmxanê yên jin di nav mêran de rûniştibûn. Geleka li ser vexwarina reqiyê xeberdan, pesnê herdu ciwanan dan û ew pîroz kirin. Lê xeberdana dersdara wan -Evêlîna

Rubênovnayê li ser hemûyan tesîreka gelekî mezin kir.

- Ev deh salan in ez li vî gundî dixebitim. Bawer bikin îdî ez bûme yeka ji vir. Hûn gişt min rind nasdikin. Bi serî de, di vî gundî ez xeyset, rabûn, rûniştin, edet bi mileteki rojhilatiyê kevn û dewlemend va bûme nas. Edetên weyî miletiyê û kultûra bilind heye û ya sereke, fikra demokrasiyê kûr û mezine di nav we. Ya rastî tiştên xirab jî hene, ez naxwazim di derheqê wan de xeber bidim. Ji bo kû hûn ji min rindtir zanin. Ez naxwazim niha pesnê herdu telebên dibistana meye here hizkirî bidim, hûn wan jî rind zanin. Dixwazim di derheqê pirseka din de, bi dîtina min ji bo rojên pêşiya me û îro girîngin de xeber bidim. Di vî şerê giran de welatê me hemû çî telî-tengasî dît, em çiqasî giranbiha bi serketin, bi me tê zanînê. Evî gundê Kurda, raste, şer bi xwe nedît, lê di serketinê de keda wî geleke.

Kanê mêrê vê jina qedirgir, kû îro deweta kurê xwe dike? Kanê bavê wî xortî delal, kû di vî gundî de mezin bûye? Kanê bi dehan xort û mêrên vî gundiye din? Wan serê xwe danîne ax-berê sar ji bo kû em îro awha şabin. Bi milyonan meriyan jiyana xwe dan, lê milyonan merivan jî jiyana xwe li ser piya dimeşandin, tîbirçî, tazî-pêxas şev û roj kiribûn yek, dixebitîn, zarên êtîm xweyî dikirin. Ew jî şer bû, minê bigota ji şerê dijmin ne kêmtir ... Mîna kû zêndî dîsa va li ber çevên meye. Karê, qîza milletê we, salên jiyana xwe yên herî baş ji bo xweyî kirina zarên êtîmên wan kesên kû bi

98

dijminê meyî bi devwxûn re şer dikirin meşand. Dîsa ji bo vî xortî kû bi eslê xwe ve ûris e, lê bi ruhê xwe ve Kurd e û em niha deweta wî dikin ... Di nav dîroka însaniyetê de tiştên awha kêmin. Gelek ji we, ez zanim, ha ji pê tunin, wekî bavê îskenderê me û Cemalê destgirtiyê Karê di pêşeniyê de bi tevayî şer kirine, hatine kuştinê û li ser erdê Ûkrayniyayê, di goreka biratiyê de defin kirine. Bi me nayê zanîne kû wan hevdu naskiriyê an na, lê tişteke tê zanîne kû Nîkolayê bavê îskender nizanibû ye kû kurê wiyî helal di gundê Kurmançayî dûr, li ba dergistiya hevalê wiyî şer -Cemal mezin dibe ...

Heta wê demê, kû gişkan ker guhdariya Evêlîna Rubênovnayê dikir, di pey vê gotinê, qey bêjî pêla bayê sar hat, kire xuşîn, di odê de derbaz bû. Yên rûniştî vî alî, wî alî bi hev re xeber didan, metel li çevên hev

dinhêrîn. Lê Şêx Sefo, kû pêşberî Evêlîna  
Rubênovnayê rûniştibû, bilind-bilind got:

- Gelî cimaetê, bi ocaxa Sorê Soran bikim, qedera  
van ciwanan ji qudretê ye... We bi guhên xwe bihîst ji  
ku ji kîderê qedera wan herdu malan hatiye bi hev  
aliye ... Mêrên mezin di pey vê gotina .Şêx, destê xwe  
birin ber bi ruyê xwe, dua kirin, lê ciwanan metelmayî  
li çavên hev dinhêrîn. Evêlînayê di dawiyê de got, wekî  
bi eşqa yekbûnê vedixwe û cara ewlîn qedeha xwe ye  
tijî valakir. '

\*' \*' \*'

Şabûna Karê bêhed û bêhesawbû. Pey dewatê ewê  
gazî der-cînanan dikir, ew naz-nemetê mayî dida wan,  
textê xwarinê li pey hev vedikir. Her cara kû wê Sîsê û  
99

Saşa didît, dilê wê di cî de nedisekinî, qey bêjî dixwest ji  
sîngê wê derê, bifire.

Badalyan îzin dabû wê kû pey dewetê çend roja neyê  
xebatê, mala xwe bide hev, şuxul-emelê pey vê şayê  
kuta bike. Heval-hogirên wê di pey xebatê dihatin, alî  
wê dikirin. Sîsê wextê ji oda piçûk derdiket kû  
alîkariyê bide Karê, ewê nedihîşt, hemêz dikir, li ber  
digeriya kû dîsa vegere oda xwe. Lê Sîsê dikeniya, jîr jîr  
diçû-dihat, zû-zû hertişt dikir. Karê ji vê yekê kêfxweş  
dibû û nikaribû şabûna xwe veşêre. Kê kû çevronkayî  
didayê, digot: "Şayî û şabûna ha bira ber derê her  
malekê be. Min di jiyana xwe de telî-tengasî gelek  
dîtiye ... Niha jî hebekî şa bibim ... "

It It It

Ew heftek bû Karê nediçû xebatê. Roja îne wê qerar da here, bighêje xebata xwe. Lê sibê şefeqê re, karkerê êtîmxanê hat, xeber dayê kû Badalyan bi lez gazî wê dike. Karê texmîn kir kû Badalyan ji bo xebatê wisa lez gazî wê nake. Ev tiştêkî dine. Dilê wê gelek caran, wextên kû xeberên nebixêrî dibihîst, mîna teyrekî birîndar dipirpiô, vê carê jî dîsa wisa bû. Di rê de xwe bi xwe re difikirî û digot: "Heye-tune dîsa diya îskender mektûb nivîsiye.

- Keremke Karê, - ewê nû derê oda Badalyan vekiribû, gava kû ew ji ciyê xwe rabû, ber bi wê hat. -Çima tu wisa tevhev bûyî, min şikir ji bo xêrê gazî te kiriye. Karê kû ev bihîst, bîhna wê di ber de hat, xwest bipirse, lê Badalyan ber giliyê wê de hat.

- Karê, diya Saşa va têtgraf şandiye kû tê... Ezê sibê şefeqê otomobîlê bişînime pey! Ew bi trenê tê. Karê  
100

zûr bûbû çevên wî dinhêrî, xeber lê biryabûn û bi wê rengê xwe qey bêjî ji dîrektor dipirsî, ew çi şêwrê dide wê?

- Çima wisa bûyî, li min dinhêrî? Ew tê, bira ser çevan bê! Dê ye, dixwaze kurê xwe bibîne, bira bibîne! -

Badalyan got, demekê sekinî, li Karê nihêrî, dîsa dûmayî kir, -çiyê, ditirsî ewê kurê xwe hilde bibe? Ew yeka, bi texmîna min, nabe. Berê ewlîn ji bo vê yekê kû ewe îdî bi mal-hale, mêrê wê, zara wê heye. Ya duda, Saşa îdî mezin e, zewiciye, her tiştî fem dike, bixwaze



jî, ez vê yekê bawer nakim, wê dîsa neçe, ji bo kû ... Tu îdî zanî, ezê çî şilovekim ... Niha, Karê, vegere malê, karê xwe bike, rasthatina dê û kur gerek em rind bibînin. Seîdê şofêrê me, ez zanim, yê jê re her tiştî bêje ... Gere wisa bikin kû gelek meriv berhev nebin, bo kû hemû yê bixwazin wê demê bibînin. Ji vir ez û Vîktoriyayê emê tenê bîn ...

Karê ji cem Badalyan xwe bi xwe jî nizanibû çawa hat-gihîşte malê. Di pey wê şabûna mezin, xebera hatina diya Saşa fikrên wê tevhev kiribûn. Gotin, şêwrêretê Badalyan guman û qewat didayê. Wê bi xwe jî texmîn dikir û têderdixist kû ew yekê nebe, lê nizanibû çima dilê wê nerehet bû. Gelo Saşayê çawa diya xwe qebûl bike, dê kû kurê xwe ha mezin, zewicî bibîne, wê çî bike?

Sîsê û Îsko li oda xwe bûn. Malê hevdayî, şûştî veşûştîbû. Karê nexwast nerehetiyê bide ciwanan. Rûnişt, demekê fikirî. Paşê rabû, merî şande pey Fata xinamî. Hate hundur, nihêrî wê Sîsê û îsko hatine oda mezin, Sîsê taştê hazir dike.

- Dayê, çima wisanî, tu tiştekb nebûye? -îsko dê, tevhevbûna wê nihêrî, jê pirsî. Sîsê jî vegeriya, Karê nihêrî

101

Û bêsebir hîviya bersiva wê sekinî.

- Şikir tu tişt nebûye, ezîzên min, -Ewê îsko hemêzkir, lê bi destê dinê gazî Sîsê kir, milê xwe bi stuyê wê re bir, got:

- Sibê ji ciyê dûr mêvanên bêne mala me, em gerek

karê xwe bikin. Li ser vê gotinê îsko û Sîsê li çavên hev nihêrîn. Pêra-pêra kete dilê îsko kû pirs derheqê hatina diya wî ya helal e.

- Îskender, dixwazim çavronayiyê bidime te, -Karê dest pê kir û him jî çavên wî nihêrî, -Evdo kiya diya te wê sibê bê ... -Demekê dîsa sekinî û serda zêde kir, -tê, bira ser çavan bê!

Sîsê sor bûbû, dê û kur dinhêrî. Saşa pey bi vê gotina dê, nêzîkî wê bû, ew hemêz kir û got:

- Erê dayê, tê bira li ser çavan bê, lê diya min tuyî ... Karê zûr bûbû li çavên wî dinhêrî, ji şabûna kela dilê xwe nedigirt, hêsir tijî çavan bûn. Sîsê li herduyan dinhêrî, nizanibû çî bigota û çî bikira. Wê demê Fata diya wê di dêrî de hat. Wê hêsirên çavên Karê, îsko û Sîsa perîşan nihêrî:

- Pîî, Karê, Sîsê ev çî we bûye? Ewê got û ha li Karê, ha li qîzê nihêrî.

- Tu tişt nebûye xwîşka Fatê, şikir tu tişt nebûye, - Karê got, ew da rûniştandinê, bi xwe jî kêlekê rûnişt, hemû tişt jê re gilî kir.

Karê û Fatê bi xeberdanê de ketibûn, lê Saşa û Sîsê çûbûn oda xwe. Sîsê çend caran ceriband wî bide xeberdanê, dîtina wî bizanibe, gelo wê diya xwe çawa qebûl bike, lê Saşa bersiva wê nedida, palda û hîvî bi wê kir kû wî rehet bihêle. Ew wê demê çî difikirî, Sîsê têdênedixist ...

Wê şevê ne Karê, ne jî îskender rehet ranezan. Sîsê

cara ewlîn, di nav wê hehê de Saşa medekirî dît. Ewê deng nedikir, nedixwast tevî pirsên nevsî wî bibe, tenê wî çaxî xeber dida, wextê Saşa tişt jê pirs dikir an jî dixwast.

- Sîsê çima wisa kerr î, xeber nadî? -Şev dereng Saşa jê pirsî.

- Tu xwe bi xwe fikrên xwe ve mijûlî, ez naxwazim te nerehet bikim.

- Hiş-sewdê min, di hişê min de tenê tu heyî, -Saşa got û Sîsê hemêz kir. Milê Sîsê yê qerqaş jî stuyê Saşa aliyan û wan demeke xurt hevdu bernedida ...

Wê siba payîzê ya çîk-sayî hewa zivir bû. Qirawiyê danîbû, lê ji her tiştî dihate kivşê kû rojê xweş be. Sibê şefeqê re ji giştan zûtir Fatê hat mala Karê.

- Bi ser çavan hatî xûçê, -Karê hahanga kursî jê re hanî, - Hela rûne, min îdî her tişt hazir kiriye. Va saetekê şûnda wê Badalyan, Apê Reşîd, Semend, Evêlîna Rubênovna û Vîktoryayê bîn. Lê ka birê Efo?

- Ewê bi tevî lawikan bê. Ka Sîsê li kuye? -Fatê ji Karê pirsî.

- Ez bi xwe nahêlim ew sibê zû rabin, ciwanin, bira ji xwe re razên.

- Wisa hîn neke Karê, ew yeke wisa nîne, bira zû rabe.

- Na, xwîşka min. Ez zanîll:, Sîsa min bi xîrete, lê ez nahêlim zû rabe. Wê rabe ji min re çi bike? Ne pez e, ne dewar e!

Lê Sîsê zûva hîşyar, li ser piya bû, ew li kêleka îsko rûniştibû, derheqê hatina diya wî xeber didan.

- Îsko rabe, kincên xwe li xweke, niha wê bên berhevbin, şerm e. Ewê dût-dirêj li wî nihêrî û ji nişkêva jê pirsî.

- Îsko, çi hawqas kûr difikirî, qey tu tiştêkî ji min vedişêrî, erê?

- Sîsê ez tu tiştî ji te venaşêrim ... Zanî ez çi difikirim?

- Çi, Îsko? -Sîsê bi teherekî rast li çavên wî nihêrî.

- Ez... Ez di derheqê diya xwe de difikirim, -Sîsê dîsa bi teherekî metelmayî li wî nihêrî. Ji rengê wê Îsko texmîn kir kû ew dixwaze bizanibe ka derheqê kîjan dê de difikire.

- Derheqê diya xwe ya ûris de difikirim. Min derheqê wê yekê bi te re qet xeberneda. Zanî çi, Sîsê, va nêzîkî nozdeh salên mine diqedin, lê min ew hê nedîtiye. Hesîna dilê min, şilovekirina diya min a Karê û mektûbên wê nîşan didin kû ew meriveke qence, dilovan û pake ... Ewê ez nehavîtime ... Ewê bo wextekê ez hîştîme ba Kara diya min kû here bi tev bavê min şer bike ... Qey bêjî tiştêk ji nav dilê Sîsê qetya. Ji vê gotina Îsko ew tirsîya, texmîn kir kû ewî fikra xwe guhastîye. Ew difikirî, eger rastî wî fikra xwe guhastîbe, lê wê çawa bibe? Lê Karê, lê ew? Pêra-pêra jê pirsî:

- Lê eger ew bixwaze kû tu pê re herî?

- Eger kû herim, tê bi min re bêyî? -Îsko bi pirs bersiva wê da. Sîsê demekê fikirî û paşê got:

- Min carekê bersiva vê pirsê te daye! Saşa ji şabûna ji nav nivînê xwe rabû, Sîsê hemêz kir û wekî birçîyan

lêvên wê yên narîn ramûsand.

- Sîsa min, hêjaye kû ji bo te emrê xwe jî bidim. Ez zanim, ku de jî herim tê bi min re bêyî. Min ev ji sêrî de texmîn kiriye. Lê tu bawer dikî kû ezê herim? Sîsê tu hela min pak nasnakî. Ez deqîqekê bê diya xwe Karê 104

nikarim bijîm.

- De pak-pak, zû kincê xwe li xweke, şerm e, -û hîviya wî nesekinî, kinc û solên wî hanîn dan ber.

- Sîsê, -îsko gotê, -tirseka bi tehrekî min girtiye, wextê diya xwe bibînim ez nizamim ezê çawa xwe xweyî bikim, çawa nêzîkî wê bibim?

Hema wê demê Karê li derê oda wan xist û îşaret da wan kû bira zû rabin. Sîsê hîviya Saşa nesekinî, bi tenê derket, dît kû Karê û Fata diya wê sifre danîne, lê ber dêrî dengê Reşîd û Efoyê bavê wê tê ...

Dengê otomobîlê hat. Karê xwest kû rabe, lê qey bêjî deh meriyan ew bi kursî ve girêdabûn. Fatê li wê nihêrî, texmîn kir kû ew tevhev bûye, bi milê wê girt, rakir. Wê demê li ber dêrî Reşîd bi ûrisî silav dida mêvanan.

Karê û Fatê derketin ber dêrî. Evdokya, mêrê wê û qîzeka biçûke mîna minminîka bedew li ber dêrî sekinîbûn. Karê ew naskir. Dîsa ew Evdokiya wê salê bû, tenê, salên derbasbûyî tesîra xwe li ser sûretê wê hîştibû. Evdokyayê dor-berê xwe, hundur dinhêrî. Ji rûyê wê dihate kifşê kû bêse bire, bi yekî digere, dixwaze zûtirê bibîne. Ewê kû Karê dît, kela alavê, kû di nav

wê de berhev bûbû, da der, ser sûretê wêye qerqaş algevezî bûn, bû qîrîna wê, xwe havîte pêsîra Karê.

- Kaara ... Ewê demeke xurt Karê bernedida, sûretê wê radimûsa. Paşê jê pirsî:

- Lê ka Saşayê min, çima ew ne li vir e? -Ewê Karê ji hemêza xwe berda, li dora xwe, li çavên Karê û yên li wir nihêrî. Saşa û Sîsê li pişt Karê sekinîbûn. Evdokiyayê tê dernexist ew kî ye, lê wextê ew bi çav Saşa ket, demeke xurt herduya li hev nihêrîn. Evdokiyayê dûrdirêj ji sêrî heta piyên wî, li wî nihêrî, qey nav-nîşanê wî  
105

dihanî bîra xwe. Tenê dê nav û nîşanên zarên xwe nas dike, wan nîşanan tu kesên din nabînin. Nişkêva bû qîrîna wê, xwe havîte hemêza kur.

- Sînok!.. -û hemêza Saşaye fireda dengê dêyî zirav û dilovan temirî. Saşa, kû dema ewil nizanibû çawa bike, niha alaveke germ ji sîngê dê derbazî wî dibû. Ewî jî dê hemêz kir, serê xwe ber jêr kir, kire nav porên wêyî qîçik, ber guhê dê hêdî got, "mama" ... Ji yên li wir gelean ew xeber nebihîst, Karê kû rex wan sekinîbû, ji devê kur cara ewil xebera "mama" bihîst. Ewî timê ji Karê re digot "inê" anjî "dayê."

Ev dema gelekî zelûl bû. Bawer bikî gund hemû li ber derê Karê berhev bûbûn. Giştî ker-lal li dê û kur dinhêrîn. Evdokiya demeka dirêj ji hemêza kur dernediket, sîngê wê zû-zû hildihat-dadihat, giştan didît kû di hemêza Saşa de digrî. Ewê serê xwe ji ser sîngê Saşa hilda, jêr ve li çavên wî nihêrî. Dît kû Karê jî rex wan

sekiniye, bi destmalê hêsirên çevên xwe zûha kir, destê xwe dirêjî wê kir. Jinên li wir sekinî, mêran jî xwe negirtin, bi destmal an çevên xwe zûha kirin. Qîza Evdokiyayê a biçûk di hemêza bavê xwe de bû û rex Reşîd, Badalyan û Evêlînayê sekinîbû, li diya xwe dinhêrî û digiriya. Evdokiyayê Karê û Saşa berda, vegeriya. Li dora xwe nihêrî. Karê texmîn kir kû hemû dercînar hatine, li wan dinhêrin, kenê şabûnê û hêsir di ser çavên giştan bûn. Evdokiyayê demekê li cimaeta berhevbûyî nihêrî, paşê, qey bêjî ji tiştêkî veciniqî, bi dengê bilind got:

- Lê jina Saşayê min ka? -got, çavên xwe gerand. Sîsê rex wan sekinîbû. Sûret, çavên wê jî sor bûbûn. Saşa û Karê ker bi çavên xwe ew nîşanî Evdokiyayê kirin. Ewê Sîsê hemêz kir, hate rûyê wê, demekê wê û bejn-106

balê nihêrî. Destê xweyî çepê navkêleka Sîsêye zirav re bir, got: "Sîsê, ez navê te ji Seîdê şoforê gundê we hinbûm. Wî bi rê de min re gilî kir kû Saşayê min saxsilamet û li gund e, heftêkê berê deweta wî kirine ... " -

Evdokiyayê ha Saşa ha li Karê dinhêrî û xeberdida. - Nizanim çima di gotina Seîd di hişê min de, min tu ha bedew texmîn dikir, lê bi kincên miletiyê ... -Li Sîsê nihêrî, Sîsê jî- wê, keniya û serê xwe kire ber xwe. Evdokiyayê Sîsê jî hanî di nav Karê û Saşa de da sekinandinê. Li yên wir nihêrîn. Pêleke şabûnê ye nexuya qey bêjî hat di ser giştan re derbaz bû. Hemûyan nişkêva destên xwe li hev xistin. Sîngê diya Saşa û Karê zû-zû

hildihat, dadihat. Ew kela hesînayê kû sîngê wan de wê demê cî nedibû, dida der.

Pey dest lihevexistinê, Evdokiya kete milê saşa û Sîsê, çû hundur, lê Karê bi dengê bilind got:

- Gelî der-cîranno, kerem bikin hundur!

Cîran çawa zû berhev bûbûn, wisa jî zû ji hev bela bûn, her yekî hesîna şabûnê ya delal bi xwe re dibir. Çend saetan şûnda di mala Karê de mêvanên hatî û ew kesên kû malxê malê keremî xwarinê kiribûn, li dora sifra vekirî rûniştin. Evdokiyayê, Sîsê û Saşa li kêlekeke xwe, Karê jî li kêleka xwe ya din dabû rûniştandinê. Ew mîna merivên birçî ji Saşa têr nedibû, zû-zû li wî dinhêrî, destê xwe bi stuyê wî re dibir, pê şadibû ... Saşa xwe bi tehrekî digirt. Karê di bin çavan li wan dinhêrî, hebekî vedibeşirî. Kesekî tê dernedixist kû bi wê yekê ew kumreşiya xwe vedişêre.

Reşîd qedeh hilda, ji ciyê xwe rabû:

107

- Şabûna me ya heftekî berê îro dubare bû, şikir destê dê û kur, di pey salên dirêj, gihîştine hev. Ev şabûna ne tenê ji bo dê û kure, ji bo me hemûyan e. Fikreke gelekî kûr û fire di vê bûyerê de heye. Ez naxwazim dirêj bikim. Werin em bi vê qedeha ewlîn bo saxiya herdu dayîkên îskenderê me, bo saxiya wî û bûka vê malê ya helal rûbixêlî vexwin... Karê, Evdokiya, Saşa û Sîsê radibine ser piyan. Yê li ser sifrê jî tevayî radibine piya. Evdokiyayê destê xwe navkêleka kurê xwe re biribû, - bi destê dinê Karê hemêz kir, pêşiyê Karê



ramûsa, paşê Saşa û Sîsê. Karê serê wê di berda û xwe bi zehmet digirt, ji kela dil alava germ lê hildigeriya, nizanibû wê çawa xwe bigre. Xwe bi xwe jî tê dernedixist ji kumreşiyêye an ji şabûnêye.

Pey Reşîd, Badalyan, Evêlîna Rubênovnayê qedeh hildan. Xeberdana herduya jî tesîreka mezin li ser wan hîşt.

Bi taybetî Evdokiyayê nikaribû xwe bigire. Çavên wê tijî hêsir bûbûn, wextê kû Badalyan di nav xeberdana xwe de derheqê wan rojên Karê yên giran şilovekir. Pesnê emegê wêyî mezin kir. Ji vê hesîna gurr hewa odê sincirî, gişka xwarin-vexwarin ji bîr kiribûn, guhdariya wan dikirin, Karê, Evdokiyayê û herdu ciwanên bengî dinhêrîn.

- Xwîşk-birayên mine ezîz, -Evdokiyayê qedeh hilda, rabû ser piya, -Nizanim çawa şikirdarî, hesîna dilê xwe ji we re şilovekim. Dilê min wisa tijî bûye, fikir rê nadin hev. Kê dê ye û bav e, rind zane kezeb çi ye!.. Di nav wan salên buhurî de pirsekê qet rehetî nedida min - gelo Karê ya kû min zara xwe li ba wê hîşt û çûm ez rast fem kirim? Dibêjin dê zarên xwe havîtiye. Ev gotina milletê we ye, ez zanim. Dê wê çaxê zarên xwe

108

davêje kû her tişt ji quweta wê dere. Ew salên gelek giranbûn. Wisa dibû, rastî jî gelek dayîkan zarên xwe dihavîtin, wan nedixwast kû zarên wan ji birçîbûnê ber çavên wan bizêre û bimre ... Lê ji vê yekê nîbû kû min Saşayê xwe li ba Karê hîşt, ji min bawer bikin! Kela

xîretê û heyf hildanê rehetî nedida min, paşê dilovaniya  
Karê û xebata wê guman dida min ... Min rast kiriye, an  
na, ez bi xwe jî nikarim bersiva vê pirsê rast bidim ...  
Niha ... -Ew demekê ker bû, fikra xwe nîvcî hîşt, bîhna  
xwe kûr kişand, paşê dûmayî kir, - şikir ji vê gavê re ...  
Min çî tengasî dîtine bira tenê bên serê min. Çend  
caran min xwest kû bi paş de vegerim, bêm, bigîhîjime  
kurê xwe û ezê vegeriyama eger min bikaribûya. Hûn  
hemû zanin, wan salên giran hatin-çûyin çiqasî zehmetbû.  
Dawiyê de ez bere-bere hînî halê xweyî giran  
bûm. Ez gihîştîme pêşenyê û min şer kir, birîndar  
xelaz kirin. Waxtê şer kême dibû me hebekî bîhna xwe  
dikişand, ez bi fikir û mitalên xwe ve dîsa dihatime  
Mêrgesorê ... Timê gumanekê derdê min hebekî sivik  
dikir, wekî hûn li dûrî şer in û zarên sêwî xweyî dikin,  
mezin dikin, yê kû bavên wan di şer de xwîn rêtibûn.  
Ev cara dudane kû ez tême vî gundî. Cara ewlîn min  
tenê Karê dît. Ev çend saetên min in kû li vir di dinyaka  
nû de me, he zanim hûn gişk pismamên min in û ez di  
vî gundî de mezin bûme.  
Evdokiya demeke xurt kerr bû, sûretê wê agir-alavê  
girtibû ... Dihate kivşê kû di nav fikrên xweye tevhev de  
dixwest ya sereke bibjêre, bêje, lê nedibû.  
- Ez zanim, niha di dil û ruhê Karê yî nazik û fire de çî  
dibe. Ez zanim, wekî hûn hemû hîviya gotina min in, di  
derheqê qedera Saşayê xwe de. - Evdokiya dîsa kerr  
bû, serê xwe kire ber xwe, bîhneka fire kişand, av  
109

dagirt, vedixwar û bi dilovanî li Karê nihêrî. Yên li wir, bêsebir hîviya wê bûn, ka ewê çî bêje. Gişkan texmîn kir kû fikrên li hemberî hev nahêlin ew qîrarê xweyî rast bide. Pey xêleke xurt, dawiyê de Evdokiyayê got:

- Ji bo min jî, ji bo dêkê ev meseleka bi zehmet e... Lê yê xelet be kû ez vê meselê safî bikim. Saşa şikir îdî mezine, ew bi xwe dikare qîrreqî... -Ewê di vir, fikra xwe dûmayî nekir, kerr bû, lê hemûya bihîst kû Saşa çawa di ber xwe de ji dê re got:

- Gelekî sipas diki~ mama.

- Eger wan salên giran bi hezaran meriya jiyana xwe neda bo serketinê, -Evdokiyayê dûmayî kir, -Karê û gelek-gelekên mîna wê û we jiyana xwe hindik-hindik û dilop-dilop da kû... - Wê dîsa kela xwe negirt, - wê nemerdîbe kû keda Karê bê bîr kirinê ... Evdokiyayê qultek av vexwar. Devê wê zûha bûbû. Kesekî deng nedikir; ew kela dilê dayîka helal derbazî ruh û dilê gişka bûbû û hîvî bûn, ka ew jina şîrhelal wê îdî çî bêje.

- Saşa, kurê min, -pey xêleke kurt, wê dûmayî kir, -tu îdî ne yê şîreta yî. Kes nikare te ji kurtiya min derxe, lê eger xwîna bavê teyî rehmetî di tamarên te de dilîze, gerek tu deynê xweyî merivî û camêrtiyê rast bînî cî. Paşê ez dixwazim kû tu bizanibî kû min nav-namûsa te, bavê te û welatê me bilind xweyî kiriye ... Bira Gênadî û yê hazir min biba?, şînin. Min qîrar dabû kû di pey bavê te ez mêr nekim, lê... Gênadî rastî min hat. Ew nîbûya, dibe kû me îro hevdu nedidît. Derê me li ber we vekiriye û ne tenê ber we, lê ber hemû gund ...

A, eva jî qedera min ... -Evdokiya demekê ker bû, dîsa dûmayî kir, -Kê zanibû ezê ji ûriseta dûr bêm, di vî gundê Kurmanca mêvan bibim û ha jî bê serê min? Kê

110

dikaribû texmîn bikira kû Nîkolayê mere min û Cemalê destgirtiyê Karê wê bi tevayî dijî faşîstên devbixwîn şer bikin, bênê kuştinê û mexberekîda bênê veşartin? Wekî me bi taybetî bixwasta awha nedibû. Qedera min bi miletê we re bê girêdanê, ezê derheqê we de gelek pirtûkan bixwînim, kê bawer dikir?- Xwenga min a ezîz, -Evdokiya li Karê vedigere, - tu ji bo min ji xwîşkê jî zêdetir î. Bira ji bo sihetê te be, ji bo xatirê Saşayê me.

Hemû radibine ser piya û bi hev re ji bo Karê vedixwin. Lê Evdokiyayê di axiriyê de got, -heftêkî şûnda wê herine Ûkraynê, li wî bajarî kû Cemal û Nikolay bi gor kirine -Wê serê xwe kire ber xwe kû kela dilê xwe veşêre Ew hêjayî bîr hanîn û qedirgirtina bilind in ...

... ..

Ew çend roj bûn kû hemûyan derheqê rastbihev hatina dê û kur, derheqê Karê û qedera wê xeberdidan ... Gişk metelmayî bûn kû jiyan çawa qedera wan hanîbû bi hev re girêdabû ...

Di pey çûyina Ûkrayna yê, çavên Efo û Fatê bi riya wan qerimîbû, bêsebir dibûn, gelo çima derengê ketin? Ne axir berî çûyinê Karê ji wan re gotibû kû wê zû bê, ji bo kû bigihêje xebata xwe.

Wê sibê, wextê Fatê şuxul-emelê malê kiribû, dixwest

biçûya teseliya mala Karê bikira, nişkêva dengê otomobîlê ji ber derî bîhîst. Ew û Efo bi lez derketin derva. Karê şa û jîr ji otomobîlê peya dibû. Fatê û Efo kû dîtî ew tenê ye, gotin:

- Tu bi xêr û silamet hatî ... Lê çima bi tenê yî? Sîsê û îsko li ku ne, ew silamet in?

111

- Şikir silamet in ... Ji Ûkraynayê em çûne Moskovayê, mala Evdokiyayê ... Karê gilî dikir, hûr-mû rê xwe hilda, bi tevayî çûne hundur malê... Birê Efo, xûça Fatê, Evdokiyayê û Gênadî çî xizmet ji me re kirin, bi zar nikarim bêjim. Ne dixwestin kû min berdin, lê wextê dîtî ez divê bigîhîjime xebata xwe, îzna min dan, lê îsko, Sîsê jî şandine Lenîngiradê kû ji xwe re bigerin ...

Dê û bavê Sîsê ji şabûna nizanibûn çî bêjin.

- Awqas tiştên gotinê hene kû ji we re bêjim, birayê Efo ... Gênadiyê mêrê Evdokiyayê mesela xwendina îsko jî, Sîsê jî safî kir. Ewê li vir bijîn û bixebitin, lê wê demekê li înstîtuya Moskovayê bixwînin ...

112

A A A A DEUDEMARI

Egîdê Xudo

Egîdê Xodo, dý sala 192 Tan de lý gundê Elegezê hatýye dunyayê. Wî dýbistana pêşîn û navîn lý gundê xwe xwendýye û paşê înstîtuya Pedagojiyê kuta kýrýye. Pýştî xwendýna pedagojiyê, lý gundê xwe dest bý mamostetýyê kýrýye. Paşê Jî bûye

dîrektorê dýbýstana gund.

Romana Egîdê Xudo ya delal "Dê û Dêmarî"

berî ku baş dý nava kurdên Yekîtlya Sovyetê de  
belav bibe, Yekîtlya Sovyetê Ji hev de ket.

Lê ya rastî, gava mýn ev romana býçûk xwend, ez  
gelekî pê kêfxweş bûm.

Qet şýka mýn tuneke ku hûn ê Jî jý vê romanê hez  
býkin.

Plştî van bûyerên dawî ku iy Rûsyayê bûn, me  
nýzanîbû Egîd lý ku ye. Lê býrayê wî yê delal Prof.  
Şakirê Xudo Îsal xeberên xweş Ji wî gýhandin me.  
Firat Cewerî Jî tevlî xebardana me bû û xwest vê  
romanê býgýhîne xwendevanên kurd.

Spas Ji bo hemûyan.

Nacî Kutlay

\*\*

Ji wêjeya cîhanê

## DERDÊ GEL

D. Isma'îl Hessaf

Roman

Benda 1

2003

[www.carcira.com](http://www.carcira.com)

[info@carcira.com](mailto:info@carcira.com)

1

Sala 1958 a koça xwe barkir , qirdkên serê salê , xwe berdan nava  
gund . mal bi mal geriyan di gotin : serê salê binê salê ,xwedê  
kurikekî bide kevaniya malê , kevaniyê dest zêrînê , destê xwe bavêj

kulînî para qirdk virde bînê . di geriyan wek ku qereçiyek li geşta xwe bi gere.

çirya pêşî dest bi karê xwe kir . roja roj ajotin çawa pîremêrek tizbiyê libo libo di nav tilîkên xwere berdide . berf bi qefla dihate xwar , çol û gund yekkerbûn . tenê nîşana serê gir hinekî cûda dibû ji dora xwe.

Gundê gir-sor bi her çil malê xweve di berfêde hate xemilandin diwê soban û bixêrîkan hêdî hêdî ber bi jorve di çû.rojeke din bûrî , bû êvar . tariyê hêdî hêdî berf himêzkir . deng ji gund biliya , tenê car carna barbara pezna û kîzkîza cewrikna ji nav gund dihat.

Simko pênc sal tewaw dikir , diket ya şeşan . palaxwe dabû kêleka deriyê hêwanê û li hewşê dinerî , çavê wî şîndikirin li ber şewqa lempê . berfê hewşa fireh girtibû . dengin ji alyê oda axê û mizgevtê dihatn.

oda gund diket başûrî hewşê û deryê hewşê ji aliyê rojava ve li mizgevtê di nerî,

2

ango şeqama nava gund mizgevt û ode ji hev vediqetand.

bavê simko ket hewşê û got:

\_lawo simko were alî min vî pezî derxe derve , emê wî êmbikin.  
simko çav li darekî gerand , dest avêt kopal , bilez pez ajot derve , deryê hewşê girt û çavnerîna gotina bavo kir da bêje pez berde . destê xwe bi hev difirikand û carna pifê dikir.

\_berd berd , dengê bavo hatê.

derî vekir , xwe da kêlekê , pez riya xwe baş nasdikir , mî çûn deryê yekê , kavir çûn yê didwa , bizin ketin cîkî din û dawî çend miyên zeîf xistin hundirekî . pez nehişî kete ser kaya bi çeh . derî li wan girtin , benê derya jidandin.

\_ha simko . te ne sare lawo,

\_na min ne sare , simko vegerand û pêre beşîşî.

\_de em herin , hîna êmê mehînê û qantiran maye.

deryê axûrê dewara diket hêwana malê , kuleka axur di dîwarê bakurde li herdû deriya dinerî , wilo bayê hundir dihate guhertin . xanî bixwe kevin dihat dîtin , hêwanek dirêj bi kunc ji rojavave . deryê oda tenê diket hêwanê ji rojhilatve . du pencerê odê ne mezin li rojava dinerîn û kulekek piçûk diket dîwarê quble . çend

3

rismên tentena bi dîwarên odêve hatibûn danîn.

simko bi dû bavo de ket hêwanê , bav lê zîvirî.

got : lawo , her cilka mêjê ( nimêjê ) deyne heta ez dewara êm bikim . bav derbasî axurbû , şewqa çirayê bi mirîtî ronahî dida axurê dirêj .

simko deryê odê bê deng vekir , hûn li ku man lawo , dê jê pirsî, wer destê xwe li ber sobê germbike.

simko çû ber sobê dît çawa agirê tepika têde dilîze . dest da ber , nerî ku diya wî berê cilika limêjê bo bavo raxistiye û misînê ava gerim li gel teştê bo danîye.

xuha mezin hemdiya alî dê karê şivê dikirin . birayê di bin xûhêre derzên dibistanê dinivisand . xuha din rahiştibû birê xwe yê sê salî û yê herî piçûk sûlêman, yek salî li ber sobê li ser pêçeka xwe bi niga dilîst.

bav derbasî odê bû . dismala serê xwe danî , çakêt ji xwe kir , qayîşa piştê vekir demaça qerebelo xist kulekê . li ser cilika limêjê rûnişt , misîn bi dest girt , pêşî nigê xwe di teştê de bi ava germ şûşt , dûvre av bi destê xwe heta anîşkê berda , piştê destê rastê tijî av bi ser çav berda , av di devî xwe werda , zendik vegerandin cî , go



4

vê teştê hilînin lawo ! rabû ser cilikê berî da quble , nêt anî û dest bi sê qamê mêja mexrebê kir.

dê şîv derbasî odê kir , şîva mêt danî ber , sifriya girarê ser tije goştê dermala , pîvazek û piçek xwê , li gel tasa avê û bê goman nanê tenûrê.

zarok başqe bi dêre li ser sifriya din kombûn.

\_jinê got : te li dora xwe kes nehişt . ewqas navmalî , şivan û rênçber . tu hilqas ezyetê dide canê xwe , evqas dewar û pez.

\_ma emê çibkin lê . dinya çileyê , cihê me tenge , vî çilî ka emê li ku wan bi cî bikin!...

\_hima te şivanê ereb “ keyafê “ hiştiba , di nav pezde xew dikir.

\_wê buharî vegere . mihemed li jinê vegerand . ponijî û got : xwedê mala seyid silo xerabike , em anîn kirin vî gundê teng, ma êdî em karin rênçbera li dor xwe kombikin ( ne war ew ware , ne buhar ew buhare .) bi serde axe naxwaze kes bi rehetî bijî.

seyd silo ... seyd silo hesîna hêdîka di ber xwede got : rehma xwedê lêbe ev çilê sisya derbas dibe di ser mirna wîre Hayiz hîna bi çil bû . berê xwe da zîlamê xwe û got : heta bavê te seyid silo saxbû , axê saw jê digirt.

5

\_hê hê , ( dinya ji kesîre namîne , her yek li benda roja xweye ) . kê bîra mirna bavê min dibir , sînga fireh , zendên badayî , bi qewet , can saxlem.

\_rehma xwedê lêbe, hesîna got : na welle kesî bîr nedibir , spîsax keçê , êvarî raza , sibê rabû wek jehriyekê lê peydabû , verşiya û serê xwe heta hetayê danî ket girê gir-sor.

\_ma em karin çibikin , çiqas kes bi vî rengî mirin û dimrin . erê emir bi destê xwedêye , lê eger textor hebûna , dibe ku rehet biba , mihemed got , hilmek li çixarê xist , xayîz ma , serê xwe rakir bi çavên xemgîn li zarokan nerî , di dilê xwede got , erê wê rojek bê hûnê jî min winda bikin , çawa min bavê xwe winda kir . lê xwest wan xeman ji bîrke , li qîzê nerî gotê : ka çayekê bide me , ezê herim odê , eger kesek ji gund nere odê , firt firt bi axa dikeve û lê dipirse

.  
mihemed çayê vexwar , potîna lastîkî xiste nigê xwe , kurk li xwekir , berî derkeve tembî kir , got : lawo ji bîrnekin avnê bidin wan qantira

\_dê got : rabin lawo ezê cê we deynim , dema xewêye , dinya sare , tepkê Sobê dikin tewaw bibin , gaza lempê Jî kê m dibe.

dê bi alîkariya qîza cî ji kuncê anîn danîn zarok ketin nav ciya , dibin lihêfên germde

6

dest bi ken û qerwerka kirin . xuha di ser serê simkore beddîa got : yadê qurbanê yadê ji mere çîroka pîrê bêje û a gur û bizinê , simko vegerand.

\_başe başe , ez birê weyî piçûk şîrbidim hûn nema bê çîrok radizên

.  
di vênavêre bavo ket oda axê , dît ode pik pikiye . dît axa wek her şev disinga odê de , dinav çar balîfan , cî girtiye , hilma li çixara xwe dixê . çend rî sipyên gund û du kurên wî li dora wî rûniştîne . lê sîpe û kesên ne giring nêzîkî devê derî û şekalan cî girtibûn . civatê silava mihemed vegerand , wer wer kêleka min , axê banê kirê.

mihemed , ser bilind li teniştâ hisko axa rûnişt . axe qutya tûtînê da dest . navmalyê axê eliyo qawe gerand . civatê yek bi yek , xîrhatin tê dan.

axe hilmek li çixarê Xist , dû zincîrek ji ewr li ser serê wî çêkir , berê xwe da mihemed , pirsî : tu û berf çawane îsal , pez û dewarê te çawa bi cîdibin , êmê te wê te bi salê xe , başe ! piştire fitilî biser mihemed de awirek tûj jê veda û got:

dem ne ew deme , katê ku bavê te seyid silo , rehma xwedê lêbe...  
\_û li ê te jî be mihemed lê vegerand.

7

axe dîsa gotina xwe berdewamkir : dem ne ew deme ku bavê te di ser hezar serî pez xwedî fikir ji xeynî dewara.

berî ku mihemed bersiva axe bide , silê amûsê , ku wê şevê mêvanbû li gund , serdana qîza xwe behokê fikir , xwe avêt nav gotinê , destê çepê Lefahiya ( kofiya ) serê xwe rastkir got:

\_Ho ... Ho ..., keser veda . werin ji min bipirsîn li ser mala seyid silo korê Hesafê Cibo , sed hezar rehmet li wan be , silê emûsê çixara xwe pêxist û gotin berdewamkir . di van çiyayên hande , li serê kanîkan , di nav dehl û baxan de , zêdî hezar serî pez û dewarê wî û bê şivan û bê gavan dihate xwedîkirin û kesî newêrîbû nêzîkî wan bibin , digotin seyîdê bêcirmanin wê bi mero vedin.

\_îca carekê , em çend xort ketin nava pez û dewarên wî , diwazde xorta bi xencerê soranî dan serê gayekî , kirin nekirin şerjênebû . min got mala we xerabibe tu ka hilînin , min xencer ji ber xwe kişand û avêt qirika ( zengelorka ) çêlekekê , min kir û nekir tiştêk bi minre dernehat.

tîq tîq bi xelê Hisko ket gotê : berde ... piştire guh li xwe kir , hat bîra wî ku mêrik xerîbe ne ji gunde û ji wî mestire ,xwest gotina xwe hinekî bicîbike û got : yanî ez dibê çilo xincer serê dewêr nake!

8

mêvan hinekî li ber xwe ket . damarê cênîkê wî zewirîn , hinekî ma û got : tu kurê axêye , ez nikarim bersiva te bi rengekî din bidim . lê dîsa ez dibêjim xincera min serê çêlekê nebirî , ev tiştê han bi minre ciriya û şahidê min hene . dibe ji ber ocaxê wan saw bimere çêdibû . civat hinekî ma bê deng . yekî din ji civatê xwe avête nav gotinê û got:

başê tiştêkî din . du zilama , yek ji wan jêre digotin nûrîko , ketin nav pezê Seyid silo û miyek girtin xistin çalê , gotin kengî pez here emê miyê ji çalê derxin . sibehê hatin dîtin ku ew mî ya nûrîkoye . ji xwe ew mî û yek bizna wî hebû dinav pezê Seyid silo de dihat çêrandin \_Ha Ha Ha civat kenî , dengê izêro bi ser yê teva ket.

zilam pirr guh li kenê wan nekir , gotin berdewamkir got : ev tiştana rastin , seyid silo bi nav û dengbû , bi meznaya xwedê , bi deha car min li bin konê wî xwarin xwariye . roj tinebû ku zêdeyî çil mîrî li bin konê wî dibûn mêvan.

silê emûsê ponijî rojê bûrandî hatin bîrê , qutî vekir çixarak dinav tilîkê xwede pêça , dema serê xwe hilda çavê wî ket çavê seyid yaqûb birayê seyid silo , got : mane va birayê wî saxe û zilamekî mezine , bera ew ji were bêje.

9

seyid yaqûb zilamekî kejî sor , rû gurover , nêzîkayî li şêstî fikir . hinekî ponijî bi keser got : xêr û xyrat pîrbûn ! nîvişk , qeymax , mast , goşt , rûnê hir , penêr , pîreka ji sibê ta êvarê nan li sêlê dixistin . çû , demeke xweşbû , nema vedigere , xweska bi wê çaxê . çavê wî

yê şîn di nava serê wî yê mezin û rût di lîstin wek ku bêriya wan roja kir.

mihemed kurê seyid silo , li apê xwe nerî, agir avête dilê wî . destê çepê diser enya xwere bir û anî û bi yê rastê dismala xwe rastkir û got : ewqas çol û derên fireh , dar û devî , rez û kaniyên avê . em hatin ketin van xanîkên teng , me xwe û dewarê xwe şewitandin.

xelê Lawê axê gotê : madam wilo hûn dizanin çima we wir berda û hatin vir,

\_ma bi reza xwe em man li vir ! xwedê mala tirko bişewitîne , mihemed got : bavê me pezê xwe daxist beriyê , hingê me xwe çepkir ji bo nerin eskeriya tirko nekin , welat peerçekirin , dinya bû serxet û binxet. dijmin welat li me kir zindan bi têla sînor pêçan , piştire hinek ap û pismam binxetbûn , giyan me . heta îro roj , dar û devyê me li bêcirmanin.

\_va çîroka betal bikin , axe got , hinekî pojînî , li mihemed nerî û got : ez zanim cê

10

te tenge , kengî berf hiliya , erd ziwabû , ji xwere erdnî Ji ê piştta gir bi ser çaboxa xwede berde , ji serê newalê Heta sînorê Kevrê-Sipî . wilo tê bibe xwedyê sê perçe erd û çaboxekê , wê besî tebin.

mihemed çeqmaq pêxist , hilm li çixarê xist li hisko nerî got : ez gelekî ji te razîme , xwedê te û kufletê te bistirîne .tu camêr kurê camêraye .axa li seetê nerî , di ber xwede got : şev dereng ket , û pêre rabû serxwe , civat tev pêre rabû . du peya ji ê axe , dan dû axê , xincerêwan di ber wande , û yekî ji wa fanos girt da pêşiya wî, civat hêdî hêdî belabû , çend xort man li odê , ji xwere ketin qerwlka û li ser qîz mîza peyivîn.

roja din berf rawestiya , gundî pêşî derketin serê banê axê , berf bi bêra avêtin û xanî bi kayê gundor kirin , ji bo dilopa nekin.

xorta sêl birin serê gir û xwe dişemitandin , çiyayê toros û kelha mêrdînê hîç nedihat dîtin ji berf û mijê.

sîpa û zaroka bûk û zilamê berfê çêdikirin . qeflek berf digerandin mezindikirin , serî jêre çêdikirin , çav û dev bo datanîn . car carna , hineka qeflê berfê tavêtin hev.

wê rojê birayê Seyid Mihemedê yê mezin, Hussên , li mala wî bû mêvan.

11

Mihemed kavirek jêre şerjêkir . ap û pismam û çend gundî anîn ser firavînê . piştî merga xwe xwarin , teşt danîn Simko misînê tije ava germ li destê wan dikir dest û devê xwe bi sabûnê dişûştin . dema Simko av li destê apê xwe Hussên dikir , nerîna wî ket simbêlê apê wî yê bijorde badayî . eferim birazî eferim , ap gotê , sabûn û ava germ dermanê tewaşêye.

piştî xwarinê , hinka ji wan goşt ji ber diranê xwe derdixistin hinkî din çixare di pêçan , hinka destmêj digirt . piştî ku çaya xwe vexwarin gundî rabûn , ew man xwe bi xwe.

\_ka lawo ka qehwê bigerînin , Mihemed ban zarwê xwe kir.

qîza mezin , keçek dirêj , çav şîn û ciwan misînê qawê anî , sîpak pêve çû , ji dest girt. agir di soba tepikade dilîst . ewrekî ji duyê çixara , li ber zikê bešta , xwe dabû hev . bêdengiyê girt ser civatê.

Sebrî kurê Seyid Yaqub , palaxwe dabû dû balgiha , bi tizbiya xwe dilîst , ji nişkêve dîwarê bêdengiyê şikand . berê xwe da pismamê xwe yê mêvan Hussênê Seyid Silo: te bihîst ku şevê din li odê , di civatê de , Hisko soza perçek erd bi Mihemedre da . ez ji şevê dîde bala xwe didimê nadimê

12

nikarim bi zanibim çima pêre ew soz da , got û nigê rastê danî ser yê çepê.

berî Hussên , bersivê bide . yekî ji civatê got : mala te , ma ewqas erd di destê Hisko deye , wê çibke jê,

Hussên dest avêt simbêlê xwe bi jorde bada . ponijî û peyêvî : na birazî , erd zêre û kes wilo zêr nade.

\_naxwe çiyê , çima da , Mehmûdê birê Sebrî pirsî.

\_ezê ji were bêjim çima da , binerin roja şerê Salih û mala Reşo û axe xwe avêt nav meselê , min barkir.

axe naxwaze kesî din ji malbata me barkin û ew dizane sixleta Mihemed girane û pêwestiya wî bi erdê heye....

\_ê ! û ku me barkir wê çi ji axê kêmbibe , sîpakî pirsî.

\_belê , wê kêmbibe , bizanibe birazî , Hisko bi me û xelkên wek me axeye . eger em barkin û gundî barkin , nema dimînê axe , ma wê axetiyê li jin û mirîşkê xwe bike . ma Hisko bi kê şerê Cibûrya kir , ma ne eşîrê ew şerkir.

raste Hisko hişt hinek gundî barkin , lê ew gundiyên bêkêr wek mala Menco . dûre mala Xelo bikê pênc gund girtin û bikê hukum li eşîra mêrsînya dikin . bine birazî baş bizanib ku mala Xelo bi gundiya vaqas

13

tiştan dikin û bi wan vaqas erdan radikin û bi wan axene . eger gundî xwe ji pişt Hisko bidin alî wê ew jî bibe wek her kesekî.

Seyid Yaqûb rî sipîyê wan ê ku xortaniya xwe li serxetê derbaskir , û dawya emrê xwe va li binxetê dibûrîne , herdem naletê li wî sînorî tîne , ewê ku ew dîrker ji şûn zaroktya wî . bi tiliya destê rastê serê xweyî rût xurand , ponijî , çavê wî hatin hev got : gutinê birazyê min

Hussên rastin . ma berî çar sala dema helbijartinê parlaminto , roja ku Hisko lîsta komûnîsta di bêrika birazyê min Hasso de dît , eger Hasso ne yek ji meba , wê mesele wilo drbasbikirna , tenê xwedê dizane bê wê çi jêkirba.

Hasso ji wê qorziyê got : gotinê apê min biserê xwene . Hisko ji minre got : bera tu xatirê ocaxê xwebe.

di wirde , Selîmê kurê Hasso bi ken li apê xwe Salih nerî û jê xwest: apo ji bo xwedê , ji mere bêje çawa lawê Reşo ji ber te revî û tu bi dû ket.

\_Na lo , ez dibê ew ji ber lawê Reşo reviya , şêxmûsê kurê Hussên bi henekî got û bi dengekî bilind keniya.

\_Kuro ma apê te , kengî direve , Salih cihê xwe xweşkir û gotin girt : dem êvare , pezê apê min Seyid Silo ravedaye li kêleka bakurî gir dema pez berî da mal min dît

14

lawê Reşo ji wirde dibêje : bêxwediye wan serê wan bixwe , ne serî heye ne binî heye . mi gotê segbav tu çi dibêje û ez çûmê , hewar bi gund ket , zilamê me û wan derketin , gundî ketin nav me em ji hev navcîkirin.

Çend rojek bûrîn , dem havîne , li cem bîra mala Silêmano başûrî gund , min dît wa ji wirde tê . segbav tu gotina ji mere dike , min xincer ji ber xwe kişand û çûmê û min got : îro dawiya teye , lawê Reşo kiras hilda û wek xezalekê reviya . berê xwe rast da hewşa odê . axe û çend zilam li ber siya dîwêr rûniştîbûn , dîtî çawa lawê Reşo dike hewar û ez bi dûde , xincera tazî di destê minde.

wey wey wey , ev çiyê , ev çiyê gund bê xwedî maye , axe got û berê xwe da min bi qîr bankir : wer vir , wer.



Hussên dît ku îş lihevket û wê Hisko li ber xelkê li mixe . bilez Hussên hat ket navbera min û wîde , şeqamek avêt min got : siktir bib ji vir , ezê herdû çavê te derxim tu carekadin tiştê wilo bike yaya newek xwe . û diber xwede got her her û ez dehvdam . wilo nehişt Hisko erza min bişkîne û min dinav gundiya de pîsbike.

15

Naxwe çima te barkir , eger ne ji tirsawê Reşove ba ! dîsa şêxmûsê Hussên bi henek jê pirsî.

Ez birevim , ez apê teme , tivinga leşkerê tirk min jê sitand , min ew girêda , fîşek ji tivingê derxist , tivinga wî danî nêzîkî wî , hingî kûçiko xwe avêt min , got ji bo xwedê , eger tu tivinga min bibe , wê mala min li mîratê keve , dilê min pê şewitî , min dev jê berda û binxetbûm.

\_Naxwe te çima barkir , Xelîlê kurê Seyid Yaqûb pirsî.

\_Piştî Hussên barkir û mala xwe bir Mişêrfa û birê wî Ahmed çû Navkurê û birê min Mihemed mal bir Sêhremka cem Edla Tahirê , min jî berê xweda Qamişlo çûm mala Ahmedkê muxtarê Hilêliyê.

jina muxtar Letîfa Hacî got : muxtar nelimale tu çi dixwaze kuro,

\_ez kar dixwazim , û min bi dilbijandin lê nerî , hingî bê bavê xweşîkbû.

\_go kuro , tudbê qey tu çavdere , tu netebitî xuyaye ha.

\_ez beşîşîm , min gotê na lê . lê wê rast digot . tîq tîq bi civatê ket

.

di wê navêre dengê bandana melê hat , mezna berê xwe dan mizgeftê û sîpe çûn gerê . bi şev civat li oda axê giyahev . çîrokvanê gund Hussênê Botî xelekeke kin

16

ji serpehatiya Restemê Zalê got û kotayî zû pê anî , hin ji ber kinbûna şevêkin zivistana û hin jiber wê şevê axê ne li odêbû.

Mihemedê Seyid Silo û birê xwe hussên hatin mal . piştî pez êmkir û serek da axurê dewara , hat li teniştê birê xwe rûnişt . bira qotya tûtînê da dest Mihemed çixarek pêça û ji birê xwe pirsî : bera paşîvê ji mere deynin dibe tu birçîbe,

\_na na ez paşîva nema dixwim , ez pê girandibim.

di wirde , herdûk man bê deng , agirê çirê li axurê dewara dîlan dikir . Mihemed, devê sobê vekir û bi şîşê tepik li hev dan . agir carek din lîst û tîn da hawirdor . zarok li oda biçûk tevde ketibûn xewek giran

Hussên bi serê herdû tilyên destê rastê simbêlê xwe bi jorde badan , li birê xwe nerî got : ji minre hat gotin ku xwarziyê te ebid-elezîz û Cemîl hatibûn mala te . tu dizane sînorê min û wan ji hev vediqetin. ez nahêlim bîn mala min , wê çima lêxin sîh kîlo mitir biqetînin bîn cem te . Hussên çixarak din pêxist û gotin berdewamkir : mine Mihemed tu dizane çiqasî tu li ber dilê min şêrîne , hila birayê meyi , din ez jê bê hêvîme . lê tu na , tim me kabê xwe li

17

ser piştê te tavêt . ez naxwazim tu deryê xwe ji zarwê Perore veke

Mihemed bi herdû desta tizbî zeft girtibû û libê wê hêdî hêdî berdida . li birê xwe nerî got:

Tu birayê meyi mezine , îro tu şûna bavê me digre û tu li cem min pirr bi qîmete , lê ez ji te dixwazim tu fireh li vê meselê binere , mine bala xwe bidê , dema xuha me Perîşanê , Ibrahîmê Hacî bê reza te kir, te ji min xwest , dan û sitandina pêre bibirim , min bi a te kir . lê mine bira , piştî mêrê wê çû rehmetê , divê em bîrbibin ku Pero diya

şeş law û du keçaye , zarokê wê hûrin , ma ne kêmanîye ji mere ku xuha xwe bê xwedî bikin , van zaroka ji xwere bikin dijmin . divê em li ber bayê wan rabin.

\_na . ji nuvre Pero nema ji mere dibe xuh . ya tê birê minbe , yan yê wêbe . Hussên bi qehr û tûndî got.

\_Hussên bizanibe . Mihemed gotê : ez Pero bê xwedî nakim.

\_wilo ! ji îro pêve , ez û tu ne birayê hev û em nema hev nasdikin , Hussên bersiva Mihemed da.

\_heger ji bo wilo , tu min nasneke tu bi kêfa xweye.

ji berê sibêde Hussên li mehîna xwe siwarbû û bixeyd ji gund derket

.

18

pîreka Mihemed nîsk ji ser tîfkê danî , taştiya mêr danî ber û jê pirsî : kanî Hussên, çima nema heta taştê. ,

\_Hussên ji bo Pero xeyidî.

\_te çilo birê xwe xeyidand. ,

\_bera sed û yek salê bixeyide . doza çî li wê pepûkê dike , heşt zarwê Perone , wê wêna ji zarokê wê qutbike , ji bo çî , taştiya xwe bi qehr xwar.

paş demekê berf hilî , giyayê şîn serê xwe bidizî ji bin axê derxist . rookê germî da erdê . xelkê piştî xwe dan dîwara , laşê xwe dan ber tîrêjê rojê , wek erdek qelişî baranê bixwaze , çûka bi kêf dikirin çîv çîv . şivana pez derxistin ser bender û devên newalan . zilama bi xar û firing lîstin . zaroka bi xar û kab yan xar û bişkîk dilîstin.

nîro Mihemed hat mal , di ponijî , jinê jê pirsî çî heye , Mihemed gotê : îro lawê Eto û Recebê ji min pirsîn ku Hemdiya bidin Ibrahîmkê Hemo.

\_mine Recebê û lawê Eto bi aqlê te nelîzin ma wexta keça me û mêraye ! dûvre kî , Ibrahîmkê Hemo sêwî û belengaz , kî dikare bi diya wîre , Sara Macêre biqedîne , ya sitar.

19

\_çima , Ibrahîmko xortekî helîme , girane û bi aqile , keç gerek li ser nesîbê xwe herin , ma emê keçê bidin diya wî. ,

\_ma te ji keçê pirsîye , tu dizane . jinê got.

\_tu jê bipirs , ma wê yekî ji Ibrahîmko çêtir bike.

paşî du rojan xwazgînî hatin , keçik xwestin , qelen birîn , xelata xalê û ber derî dan ber çav . piştî heftîkê ew guhestin . ebe lêkirin . dismal bi ser çavê wê dakirin , bûk li ereba bavê kirin . çend keç pêre siwarbûn . bi çepk û stiran ew derxistin . erebe li dora gund û gir gerandin . komek xort û keç bi sindoqa bûkêre berê xwe dan mala zavê , rojavayê gund.

zaroka dan dû ereba qantira . zava li ser ban di bin çepkên xortande çavnerîna bûkê dikir .dema bûk giha , zave şerbikê Firinga ji jorve avêt xwarê , zaroka xwe dadan firinga , qîj qîja xorta lîlandina qîza , teq teqa demança , şahiyê girt ser gundê gir-sor.

tenê diya bûkê , pala xwe da deryê mal , hêsirên xwe paqijdikir , digot : ma wextê keça min û mêrabû herdû kurên wê yên piçûk li kêleka wê bi axê dilîstin.

kulîlkê nîsanê şîn û sor û zer erd xemilandin , bênder hatin raxistin ji giyayê şîn , bêhna gunkavirka difûriya ji

20

hawirdor. newalê hîn mişt ava barana , xemilîn ji lavlavk , tirşok û tolikê . beqa dikire qurqur . minminîkê rengareng gul dimiştin , mêşê hunguv li hawirdor dikirin pinge ping . qîza pêşmalk û daw li

xwe pêçandin , xilç ( hadûde ) di dest wande kereng radikirin . pîra Fincê teneka wê pêre rêx dida hev.

êvarî bavo hinekî dereng vegeriya mal , pez diçêrand li ber devê newalê li serê zada. şîva wan dereng ket.

li gel ku bavo xwarin başqe jî dixwar , lê kuflet her li bende dima.

\_ka lawo , tasek av bide bavê xwe , bav ji qîzêre got , û gepek goşt hilda ber devê xwe.

\_beddîa ku neh salî bû bi lez av danî ber bavo.

Mihemed kevçî hilda ber devê xwe , wilo hişt li pîreka xwe nerî , bi beşîşandin gotê : tu naxwaze here malbavana û kefçî xist devê xwe

.

Jin veciniqî, herdû çavê wê vebûn , serxetê , mala bavê min , hatxê, bê bi xwedê , ma çawa ez naxwazim herim , ev çend salin ku ez neçûme , dê û bavê min bira û xûşik , hêsirê wê hatin xwarê , xwedê mala tirko xerabike , çawa destê dê û kezebê Ji hev dibire , çawa mero nikaribe

21

dê û bavê xwe bibîne û orta me nîvroj meş tune.

\_megrî , megrî , gerek tu bikene , sibe ezê herim Qamişlo ka daxwazê we çine , ezê ji were bînim . ezê te û zaroka serxetbikim . dibe xuha min Pero û zariwê xwe jî biwere bîn.

zarok ji kêfare firîn şîv nema xwarin , hê.... hê emê herin mala xalê xwe , hê .... hê.

\_tê tenê çilo îşê xwe birêbike , xwarine , şûştine jinê got.

\_wê biqede , tişt nabe , hîn mûsim negihaye , herin , mehekê hûnê bîn va Hemdiya li gunde , xuhê min şemsê û Gulê jî wê haji min hebin.

\_Hemdiya , belengaz , ev çend salin digo : yadê jibo xwedê , em herin mala xalo serxetê , mêrkir û neçû . rabû tepsikên xwarinê û sifrî rakirin.

wê şevê xew neket çavê zarokande , fikrekê ew dibirin , yekê ew tanîn . sibê zû ji mêjêde , Mihemed qantir xistin ber erebê, çend mî xistinê , berê xwe de Qamişlo . piştî nîro vegeerî . ji zarokanre cilin nû anîn û hinek pêşkêşî bo merivên serxetê wek cil û caw , kofiyên jinan , çayê, çend pakêt katjimêrek bêrîkaji xezûrê xwere û tiştin din.

22

roja didwa ji berê sibêde Mihemed berê zaroka da gundê Doda. rê nekine, dor sîh kîlo mitr heye .divê herin gundê Nêf \_ Elîfero \_ pira Hermê şêxo \_ Sada dûvre Doda . Mihemed rişma qantira dikşand çu dikir wan , car carna qamçî tavêt wan.

sibe sarbû , zarok dibin lihêfêde di xewre çûn , tenê kurê wî yê mezin ku 12 salî bû li kêleka bavo xwe kiribû şifêr . li pirê roj hilat , tîrêjê xwe avête hawirdor .hêdî hêdî germiyê cih li sermê tengkir .qantira car carna devê xwe tavêtin genimê kêleka rê . riwê erdê hatibû xemilandin ji genim û kulîlkên zer , çûk ji hêlînan difiriyan bo taştiya xwe peydabikin . çiyayê toros îca xweş dihat dîtin.

ji nişkêve rovîkî li oxira erebê xist , qantir cefilandin.

\_bêxwediyu erê welle , bavo got.

\_rovî , rovî îssa bankir.

\_zaroka serê xwe rakirin.

\_ka ka Simko pirsî.

\_çû lawo çû ket nav zadde.

\_çima me nedît , beddîa giriya.

\_ha ha ha , bav ji dil kenî , tu razaye , dixwaze rovî bibîne.

îca zarok rabûn serxwe . Doda nêzîk bubû bi bêriyare ketin gund.  
Mihemed berê erbê da mala hevringê xwe Sofî.

23

\_Sofî , Sofî Mihemed li derîda û bankir.

\_kiye , deng ji hundur hat , dengê nîgekî dihat , derî vekir ,  
Mihemedê , kuro , Sofî got.

derbasbin derbasbin , derbasbe xwako . Eyşê , Eyşê were va xueha  
te hatiye , ma tu nayê pêşiyê.

\_Hessînaye keçê , Eyşê got . xwe avêt xuha xwe , çûn lep û riwê hev  
. zarok maçîkirin, qurbano derbasbin . derbasbin hûn ser serê  
xaltîka xwere hatine.

\_Sofî li Mihemed nerî , go : tê zaroka serxet bike , hayê min jê heye  
, Ferhanê xezûrê te doh tembî li Eloê rêber kiribû.

\_ka rêber li kudê ye , Mihemed jê pirsî.

\_vê sibê bînxet bû , emê wî peydabikin.

\_rêber bi kêrhatiye,

\_hû , êvara serxet dibe , siba bînxet dibe Sofî got.

nîro Pero û zarokê xwe , gihîştin Doda . piştî firavînê , Sofî çû ban  
Elo kir . zilamekî hûr , neqelew , kumek li serî , çik çikandî , çar çavî  
silavkir û rûnişt.

Mihemed xêrhatin tê da , dest avête qutya tûtuna qaçax dayê jê  
pirsî : birayê Elo tê zarokê me serxetbike wan bigihîn Hatxê mala  
Ehmedê ûssivko , tiştê tu bixwaze ezê bidime te . Elo got : Ehmedê  
?ssivko ev çavê mine , gelek qencyê wî li ser min hene.

24

Ferhanê kurê wî bixwe dostê mine , malbatek bi nav û dengin û pîrr  
camêrin . pîreka te û xuha te xuhê minin . Elo got : û hilm li çixarê  
da , ponijî got : îro êvarî hazirbin.

\_ma tirs tune li ser zaroka , Mihemed pirsî.

\_na na binavê xwedê tişteke tune . nobedarê turk min nasdike , ez pera didimê û derbasdibim , turk bavê xwe bi pera difiroşin.

roj çû ava , taryê hêdî hêdî gund û çol himêzker . Elo hat , zarok komkirin û got : mine gelî xuşka hûn netirsîn , tişteke nîne . têlê xetê nizmin , hûnê bibin rêz , bidin şopa min , kes ji xaçirêkê dernekeve . bê deng , hêdî hêdî pênc deqene û em serxetdibin , li wî aliyê xetê li bende mene , kekê Ferhan , ev çend şevin ku çavnerîna we dike . îşev li bende meye.

rabûn xatir xwestin , Eysê û zarokên xwe jî bi wanre bûn heval.

ji gund derketin , gund li ser sînore . nêzîkî şiva tirênê bûn , Elo go: rûnên , ew çû bi pêşde ponijî da bizanibe tevgera sînor çawaye . dorbîn danî ber çavê xwe , li jor nerî.

\_ev eleman çî bê bavîn , jêhatîne mine kuro ev şiva han ji elemanya hete mûsilê,

25

danîne . Mihemed got , dixwest sawê Ser zaroka hilîne , wilo elektrîk ( bijiktora ) Turka şewq berda , şev kir roj , şewqê ji roj hilat tavê rojava û vedgeriya , zarwa , xwe kirin perçek ji erdê . careka din bû tarî.

\_Rabin , bilez rabin , Elo ferman da.

Mihemed , zarok maçîkirin , got : lixwe û li zaroka miqatebin . ew û Sofî man rûniştî guhdarî kirin . heta agirê fanosê li ser banekî li gundê Qesra , li aliyê serxetê dîtin. fanos îşareta wan bû go giyan. wê şevê li Qesra , li mala merivekî bûn mêvan . bi taştîyare bi du qantiran û du keran gundê çûva derbaskirin . nêzîkayî li Hatxê di kirin . kelekê Hessîna bir , yekê ew anî , ev deh sale ku nehatiye malbavana, çavê wê yê şîn tijî hêsêr bûn.



dema nêzîkayî li bênderên gund kirin zarokya wê hat bîrê , xwe dît keçîkek piçûk xwediya yek gulîkê , bi keçîkê hevalê xwere dilîze , kela ew girt , bihustek ax tune ku wê nasnake , ka keçîkê hevalê wê li kune , çî dikin , ket xem û xeyala , tenê qîj qîja zarokên Hatxê ew bîranîn jê dûrkin.

dema Hessîna serê xwe hilda , qesra bavo ya dûqat dît , kup kup bi dilê wê ket di dilê xwede got ku kevirek di qesrêde tune ku wê nasnake , erê têde çêbûye û hatiye xwedîkirin , dilê wê bêtir lêxist dema dê û

26

bavê xwe naskirin di nav komêde a çavnerîna hatina wan dikirin . keserek veda , mala xwedê ava , dê û bavê min saxin.

Hessîna bilez xwe avêt himêza bavo , serê xwe danî ser dilê wî , destê wî maçkir piştî xwe avêt diya xwe , destê xwe xist hustê wê . yadê qurbanê , çû riwê wê . diya wê rûkê wê maçîkir , hêsrê kêfê paqij kirin, li hev pirsîn dûvre silav hate berdewamkirin.

\_derbasbin hundur , derbasbin bavo berê xwe da keça xwe û da pêşiya wan . zarok seraser berê xwe dan jora qesrê , werin lawo werin , dê ji wanre got : hûnê bighin herin jor.

hundur pik pikî ji meriv , gundî û dostan dema mêvan belabûn , Hessîna ew pev dan naskirin got : ev kalkê weye û ev pîrka we Sarkêye ango diya mine . eva han pîrka we xanêye.

\_wa ma qey du diyê tene beddîa ji dado pirsî!

xwedê nehiştî , tiştî namîne ku îşê xwe jê nayînin , dê biken got û bersiva keçê pêre da.

\_erê lawo , pîrka we Xano jinbava mine , ew jî pîrka weye.

\_bê çî qureye . pîra Xano bi sertî got.

27

\_zarok bîra hertiştî dibin , Hessîna got , hevnaskirin berdewamkir.  
\_lawo , wê du sê roja me tevda nasbikin , diya wê Sarkê gotê.  
\_ka îca xwe bime bidin naskirin , birayê wê Ferhan jê xwest.  
\_ev dişamin Peroye jina rehmetiyê Ibrahîmê heciye , ev zarokê  
wêne evê din heçê xweşik yê minin û yê kor – mor û çav şelêqî yê  
xuha we Ayşê ne.

civat tev kenî , ji xwe keçka minî mezin me berî çend roja da mêr.

\_lawo zaroknî te mirine newlo , pîra Xano pirsî,  
\_erê yadê , Hessîna lê vegerand , keça minî herî mezin Zekokê , jin  
bu , şevêkê piştî şîva çû mala apê xwe Sebrî, li vegeerê Hussênê  
Hemê , nebxêr , pez nû anîbû guherê û xwe xistibû qorzîka dîwêr  
rûniştibû , keçkê saw girt , hat go yadê , tiştêk wek pîrebokê bû li  
ber deryê me rûniştiye . bavê wê çû nerî , hat gotê : tişt tîne lawo  
ew kundê Hussênê Hemêye yê cibilgirawî.

keçikê ta girt çend roj di wê navêde neçûn mir . kela girî kete qirikê  
 , gulîkê wê digyan erdê û keça din Rebîa pişt serê wêde çêbû ,  
nexweş ket , ji bêxwedîtî mir.

28

\_ma textor li cem wejî tinene lawo , bav jê pirsî.

\_hene lê kêmin , li Qamişlo çend textor hene wek textor Nafis û  
textor Qasim , orta Gir-sor û Qamişlo bîst kîlo mitirin.

piçkî ma û got : kê ha ji textora heye yabo ! , xelk belengazin.

\_yabo , yabo , Hutî bankir , va apê Mûssa hat.

\_sibha we xêrbe , Mûssa silav kir , ka mêvana we ya ezîz,

\_rebenê ! , apê Mûssayê Entere , Hessîna got û çû destê wî ,  
xêrhatin têda û li hev pirsîn.

\_ma zarokê te naxwînin te ew anîne , apê Mûssa pirsî.

\_hew Issa di xwîne , evê din hîn piçûkin.

\_û keçik , Mûssa li Bedîa nerî got.

\_keçik narin medresê , mele dibêjin gunehe ku keç herin medresê

\_medrese , bi kurdî , jêre tê gotin dibistan . Mûssa got: ji xwe mela mala me wêran kirine . em hiştine nezan bi gotinê wan nekin lawo , qîzê xwe bişînin dibistana , bidin xwendin.

\_apê Mûssa kes keçê xwe naşîne , ma yame tenê wê herê , Hessîna got.

\_ji xwe mesele divirdeye , kî wê zengil têxe hustê Pisîkê.

29

\_ê , tu ka wer cem apê xwe , Mûssayê Enter ban Issa kir . jê pirsî tu sinifê çende,

\_yê pêncê me.

\_bi çî zimanî tu dixwîne,

\_bi Erebi.

\_ê , emê çibkin , li vir zarwê me fêrî zimanê Turkî dikin. û li wir Erebi . yek mal, yek eşîret , yek millet , lê her yek , bi zimanekî dixwîne , dixwazin kultûr û zimanê me tune bikin.

\_wa cêba polîs hatiye gund , dengê ji alyê derî hat.

\_rewş nexweş dibe , vê pêlê , pirr diçin û tîn , Mûssa got û rabû serxwe.

\_Ehmedê Yûssivko , pêve rabû , çû ew di mal de veşart.

\_Simko hat ber diya xwe , bidizî tişteke got.

\_erê lawo erê , dê lê vegerand.

\_çî dixwaze , pîrkê pirsî.

\_dibê te gotiye mala kalko bastîq û benî hene.

\_ez biqurban , pîrkê got . her tişt heye , benî bastêq , mewij , guîz , nok , tirî û behîv ( beîv ) û herweha.

\_zarok li ser sifriya mezin cî girtin û xwarin.

danê êvarî , zaroka dan dû xalo Ferhan berî dan rohilatî gund nav  
bexçe û rez , dan ser riya Cibiltînê , ew devera jêre tê

30

gotin Cencel . di wê semtêde teht û şikeftê Kevnin . rê di ser  
şikeftare diçe . dora kîlo mitrekê birîn giheştin rezê xwe û yê mala  
Oskê Ehmê .di rêde zaroka xaçirêk girtin bi dû hevde bûn rêz . li  
hawirdor kevirên piçûk û mezin , stiryên beloq . zarok behitîn , tiştê  
wa qet nedîtibûn , raste li gundê wan , rezê mala axê dikeve ser riya  
Kotiya , lê newek vî rezî ye.

dar û devî, ava kaniya zelal , hêdî hêdî , di nav gul û kulîlkên ciwande  
avê hev tajot. darê renga reng , bilind ber bi ezman, bi roka êvarîre  
dilşad dibûn , çûkê deh reng bi stran roj dispartin rojê bûrî.

dêliyên tirî , hîn nû taze di bişkiwîn bi şewq xêrhatin di wan dida.

dihat dîtin ku rez bi hostayî hatibû danîn.

\_werin , werin cem xalê xwe , Ferhan ban wan kir . werin li hirsim  
binerin , nêzîk wê bibe goşiyên mezin , ev tirî jêre tê gotin tiryê  
mezrone , ha ji mara hebin ha , li xwe miqatebin . ez nabê bitirsin lê  
ez dibêjim , li xwe miqatebin , car carna mar xwe li mêwan dipêçin.

\_xalo ewa han çiyê , Simko pirsî tiliya xwe bi aliyê jorde vekir.

\_ev jêre tê gotin kozik , divirde ez xwe vedişêrêm , kewê xwe  
berdidim . kewê min

31

dixwîne , dixwîne , heta kewek bê û têkeve dehfka min.

\_ma kew dixwînin xalo , yekî pirsî,

\_dixwînin , yanî dikin qeb qeb , yanî distirên.

\_ha ha . zarok kenîn , medigo qey birra dixwînin.

\_Ferhan ji dil kenî , qelevîzka rûnişt , qutya xwe derxis , çixarak pêça , zimanê xwe di ser jora pelê çixarêre bir , bi du tilîkên destê rastê , pel jêkir , tilî diser çixarêre bir û anî , bi çeqmaq çixare pêxist.

êvarî civata gund wek her şev li oda Ehmedê Yusivko geriya . ji beyanî ta êvarê , gundî di erdê xwede , kardikin , ê ku li nav rezê xweye , yê ku bîstanê xwe pak dike , yê ku diçe êzinga yan rêsiya . hin ji wan pezê xwe diçêrînin , çavnerîna mûsimê Nîsk , ceh û genim dikin . civat xêrhatinê di hevdidin , li hev dipirsin , qotiyên çixaran tavên ber hev û li ser rewşa xwe dipeyîvîn.

\_îsal êzing pirin , bêminet emê xwe vî çilî germbikin , yekî ji civatê got.

\_her tişt pirre , sal xwedê bistirîne , bi xêr û bêre . zad û rez başin , newal tijî giyaye , emê têra xwe rêsiya çêkin . yê kêlekê got.

\_yekî din kenî , got : das û qalûçkên xwe tûj bikin . dûre got : a giring tûtine , ji mêjve Mecîdê qaçaxçî bi virde nehatiye.

32

\_wê bê , yekî lê vegerand.

\_ji wirde Ehmedê Nûrko gotin guhert, kuro , çiqasî leşker , polîs , cendirme , va dema diçin aliyê nuseybînê.

\_ma leşker tenê , Misto got û balefir , li ser vî sînorî dîsa gir girê wane.

\_tiştin hene , ahmedê , Yusivko got : her liwan tengtê , tevgera wan zêde dibe.

\_ya ella , ya kerîm , Sofî Biro , diberxwede got , ji bo ku xwedê me bistirîne divê em herin , toba mala şêx.

\_tobe serê te bixwe erê welle ,ti têt tobe nabe , Salih kurê , Ehmedê Yusivko jêre got.

\_ez benî , Mussayê Enter , gotin girt : turkiya yek ji dewletên , pakta qolinyalizmêye , dijî qomonîsmê û dijî tevgera gelê kurde , ji roja ku îraqê xwe ji pakta bexdê Kîşand , tebatî nakeve , çavê tirkode , eve çend salên ku tirko lîsikên iskerî dike , pirr hessaba ji yekîtiya soviyet dike.

\_xwedê me bistirîne ji qomonîzmê û ji kufaran . Sofî Biro , got : em tev misilmanin çî kurd çî tirk ma ne wiloye mele,

\_Sofî berê gotinê da melle Hussênê Kêfo.

\_xwedê dibêjê , ku wî ji we êl û millet pêkanîne , bo em hev nasbikin . îca em tev misilmanin , pêwiste em limêja xwe miqatebin , zika xwe bidin , herin hecê , ê

33

ku karibe , ev dunya faniye , heyata rast û dirist li wê dinyê ye . xwedê me bistirîne ji a go me ha jê nîne . mele tizbiya xwe dibir vî alî wî alî û lêvê wî dilebitîn.

\_xwedê ji te razî melle , xwedê ne gotiye tadê li hev bikin , Ehmedê Yusivko li melê vegerand.

\_civat bê deng bû . Hussênê qelew , çavê xwe firmand , di civatê de dixewre çûbû , dest avêt qotiyê û got : îro zarwê mala Nebo jibo sînor kirî hev kuştibana . herdû bira Hissêno û Xelîl , vî digo te sînor bi ser xwede berdaye , vî digo te berdaye . mi go lawo qey tilya we ketiye çavê we hûn birê hevin . hilmek li çixarê xist pala xwe dîsa da balifa.

roja din beyanî , jin çûn ser çala avê , kwîz û tenekê xwe dagirtin , zarok li gel jinan ji xwere dilîstin . rojek xweş û ciwan, hemû pê kêfxweş dibûn . dema ku havînîde ava barana di çalande di çike jinên gund bi kuîza û teneka av ji çemê ku mehê carekê ji Stilîlê av berdidan û berdidan çala.

carekê mar û çêlîkê xwe bi avêre ketibên çalan , rojekê Ehmedê Yûsifko , keça xwe Henê Berda çalê da ku dewla xwe derxîne , çêlîkê maran bi nigê wê veda.

\_yabo , min derxîne mar bi nigê min veda.

\_yaho ti çi dibêje , mar ji ku li wir hene.

34

çalê ava baranê , comal ji jorde kaşin , ji bo ava herikandî bikeve çala , da ku havînê tî nebin.

nişkêve dû trimpêlên polîs wekî berqê nêzîkî li gund kirin . jin û qîz bilez berê xwe dan hundira , zaroka bazdan li ber deryê hundiran bûn kom , deng ji wan biliya . tirsê Girt ser gundê Hatxê. polîs peyabûn , ser bi kum , newqa wan bi qayîş, şerwal ji binve bin bot kirî , kilaşinkof di dest wande , agir ji çavê serê wan diçe.

nuxtar “ nêrde gêtî “ bi tirkî meznê wan got : Ehmedê Yusivko derket diber xwede , got : ev segbav dîsa çi dixwazin , berê xwe da wan . silavkir , lê hîç polîs silav venegerandin . yekî ji wan migrefon da ber devê xwe û ban kir : piyawê Gund tev kombibin di deh deqade amedebin , gundî hatin çi ji mal û çi ji çolê . tirsê ew girtin.

\_serbazê Tirk , demaçe di berde , bi destê rastê qamçî girtibû pê li destê xweyê çepê dixist , diçû vî alî , dihat alyêdin û leşker berê kilaşinkofa dabûn zilama.

dawî serbaz rawestiya got : ev xak xaka tirke , em tevde di bin ala tirkde dijin , yê ku bavê me Kemal etaturk bo me danî , em tev tirkin û zimanê me tirkiye . serbaz serê xwe hilda dît teyrekî baz , pîrr ciwan , ji xwe razî bi teqil di ser wanre difire , demaçe derxist teyr anî xwarê nêzîkî wan

35

ket . got cendirmakî , leşker teyr avêt ber lingê wî . serbaz nigê rastê danî ser newqa teyr û got : binerin , kesê bi ame neke , dawya wî wek avî teyriye . di vî ezmanîde cî tune ji teyrê tirk pêve.

hinekî serbaz ma sekinî , got : gotinên mezin têne gotin di civatên wede , ji bîra we neçe , ku ez karim we teva tine bikim , û gundê we bişewitînim . ha ji xwe hebin.

ya didwan , ku we mûsimê xwe hilanî qereqolê Ji bîr nekin , em ji enqerê û izmîrê hatine vira , ma em beqa li vir dixesînin . ketin tirimpêla xwe , li dawiya gund du leşker peyabûn bizina pira Helîmkê ji devê deryê wê girtin , şerjêkirin , avêtin cêbê . toz bi ser cêbê ket berê xwe dan qereqolê.

pîra Helîmka Qewês sînga xwe ji tepa anî xwearê , porê xwe kişand , bû hewar hewarê wê , hewarê hewarê , ew bizinbû , ew jî birin , agir bi mala tirko keve , li wan bibe jehr . de yadê ka îca ezê debara xwe ji ku bikim , min bi şîrê bizinka xwe kêfkiribû.

Ehmedê Yusivko ban pîrê kir , gotê derdê bizinka te yek ji hezarê derdane , xemnake, bizinekê ezê bidime te.

\_mala te ava , xwedê Ferhan ji tere bihêle , hûn ji bav û kalade camêrin.

zêdî du heftiya bûrî , bi ser hatina Hessîna gundê Hatxê . êvarî Hessîna ji bavê

36

xwe xwest destûra wê bide here mala xalê xwe li Xirabreşk û mala dişa xwe li gundê Terê.

\_herin lawo , bav gotê , sibe ezê we birê bikim , çend rojekî bimînin û vegerin.

sibê zû zarok li kera kirin , berê xwe dan Xirabreşk , mala xalê pîrka xwe Sarikê . xalê wan Ferhan bi wanre çû . rê dor du seeta kişand ,



li nêzîkî bênderan Sarkê ji qîza xwe Hessîna pirsî , tê bîra te keça min wê salê ku xalê te Xelîlko mir û em hatin şûna wî , Sarkê keserek veda , ê dinya ji kesîre namîne.

wilo mala xalê wan hatin pêşiya wan , hûn bi xêr û ser çava hatine , îro çend rojin em nerîna hatina we dikin . ma we xwe li Hatxê çand zaroka zû sawa xwe hılanîn , qul û kuncin mal naskirin , karê wan di sefikê de bi derencê diketin kewarê , çilekî dikirin.

\_Simko riya kewarê baş naskirbû . diçû jorê tiştêk tanî û dadiket . yan diçûn hewşê li kerê siwardibûn . carna girê xwe di kew didan . diçûn ser çalê ku av ji kaniyê hebîsê dikşandinê , bazdidan . êvara li ser ban , xew dikirin li ser irzêlê pûş , bayê hênik liwan dida , xweş xew dikirin paşî westandina rojê.

37

çiyayê toros ew himêz dikirin , wek dayika dil şewat . derd jiwanre tinibûn . derdê wan lîsk , çilekî û kêf bû bîra derdê jînê nedibirin . raste bi mezinare li ser banekî radizan , lê hayê wan ji derdên dê û bavan tinebûn.

beyanî çûn nav rez û bîstên newalek kwîr diket binya rez . riya rez di jora newalêre derbasdibû . ji jorve , nerîneke ciwan dihat dîtin . deşt , gund , newal , çiya û herweha.

\_Beddîa li pişt Simko li ker siwarbûn , Simko rişma ker kişand rê berda û berê ker da nav rez . nigê xwe yê piçûk li newqa ker xist , bo ker xwe ser kêşa kevirare bavêjê , lê ker zîtirk da xwe hilda herdû avêtin xwarê bi ser kêşa kevirade . dê bi bazdan hat bi wan ve , Beddîa giriya , got : Simko nebxêr ji tere , tu jiku zanê kera bajo , te çima lingê xwe lê xist , herdû rabûn srxwe.

dê dit tiştêk biwan nehatiye , kenî , destê xwe diser porê keça xwere bir got : gurîkê ma ajotina kera zanebûn jêre divê,

li wî aliyê rez <ssa û Evdê lawî xalê xwe Ferha û Cemîlê metka wî pero ew berî wan giyabûn.

Simko û Beddîa zû ketina xwe ji bîrkin , bazdan nav rez , bêhna darên hejîra ew xwarin , hinarên ciwan , lê destê wan bêtir

38

digya tirî li vegeerê nêzîkî malê , xurê Laşê Cemîl girt , qîr pêket.

çi bela teye lawo , tiştêkî bi te veda yê , çiyê , jê pirsîn benê noqa wî vekirin dîtî ku bin kiras mişt hejîr kiriye.

\_heyla xwelî li serê tebê erê welle , bê çi deware , ma kes hejîra dixê Ser laşê xwe , ti aqil nagre , diya wî jêre got û ew bir şûşt.

wilo pez ji çolê hat . hinek çûn bi pezve û hinek çûn taştê hazirkin . zarok li ser deng derketin derve . dîtî di pîrek şer dikin li ser dora tenûrê . Xecê û Rismo tiştêk di hev nehiştin bi xebera.

Xecê digot : Rismo bav gilikê , çi roja ez bêm ser tenûrê , tijî tê bê , hey min serê bavê te di tekirê.

Rismo dengê xwe bi ser ê wê dixist , qûnek jî xebera didin , ti bê xwediye xwedî te hebûna , wê gilka te jêkirina . porê hev girtin , hevdû birin û anîn . heta Hemoyê mêrê Rismo hat şivek dido avêtin jina xwe , berê xwe da Xecê gotê : şerm bike ji bavê xwe , dawî hûnê mêra pev bidin kuştin . Xecê serê xwe bera ber xwe da tişt negot , dîsa rahişt şîşa tenûrê , û tenûr pêxist.

paşî çûna Hemo ne bi tiştêkî Misto mêrê Xecê ji mal derket , zir qotekî dara di destde , berê xwe da cê şer û hewar

39

hewara wiye : ka Hemo , ka ew seg bav , îro ya ezim , ya ewe , li jina min daye.

rabû Eyşokê gotê : xalê Misto mêrik li jina xwe da ne li a te.

\_bira keçê , Misto ji jina xwe pirsî.

\_raste jinê lê vegerand.

\_la hewla wela , Misto di berxwede got , ev zarokana , kirî em pev bidana kuştin.

roja din , ji beyanîve , gundî wek gêrikê , xebitin dinav erdên xwede , ji dûrve , dengê dengbêjekî dihat , tavêt ser keleha mêrdînê . car carna ewt ewta kuçka û zir zira kera bi ser dengê wîde diket . wê rojê mêvanên Xirab\_ reşk berê xwe dan gundê Terê çûn mala Eyşanê qîza Seyid Silo dişa Hessîna.

hawir dor dar , rez , dehl , zad . gundî jin û mêr kardikirin , erdê xwe ji zîwanê paqijdikirin , hineka dora lemê bîstên xweşdikirin , hineka rêsi çêdikirin yan qurmik radikirin.

Simko dabû pêşiya wan , bazdida dîsa liwan vedgeriya . carna çûka ji kêleka rê ji nişkêve difiriyên ew vediciniqandin.

Hussênê Pero , li dawî qîrker giriya , ay yabo nigê min çû . xwedê te nehêlê , erê welle , ti biqurbana Simko be , diya wî jêre got . çima ti wilo fayînî,

40

Giyân serê kaşekî û berjêr bûn , nêzîka gundekî li kêleka rê , bala xwe dan ku di keçikên piçûk li ser tirbekê rûniştine digrîn porê wan gijolî , nig xwas , cil gemarî.

\_çi bela weye lawo , hûn kîne , livir hûn çidikin,

\_ya hinekî mezin serê xwe hilda bi girîkî şewat got : diya me doh mir . yanî wê jimere birak anîba , îca mir.

\_naxwe diya weye , digotin pîrekek diber halê xwede mir Pero got

.

zarok man bê deng dema bihîstin navê dê û mirinê.

Simko qelevîzka rûnişt ziq li wan nerî . di dilê xwede got : mirin nexweşe , mero digrîne , mirin çima heye,

\_haho keçê ( lê bine keçê ) pîra Sarkê diber xwede got , ev jina dehayê , di vê berya mede diber halê xwede dimre . textor dibin li Mêrdînê û Amedê hebin , lê yadê dûrin . wê kî bigê wandera , wê jinka avis bi çi bibin , serê xwe hilda dît çend ciwan çiyayê toros tê dîtin . çavê xwe xist çiyê û keserek kwîr veda.

tenê gundê Terê gundekî xweşe , benderê wê firehin ava kaniyê xweş , li jêra gund . zaroka dilîstin , zarwên metka xwe , Mihemed Cemîl , Zubeyda, naskirin . zarwê Qenco axa pismamê Ehmedê Sulêman axayê omer . carna Cemîlê Qenco

41

li Simko dida , digotê : çavê wî yê şîn , tu dibê qey gawire ! Simko carna ji ber digriya , dihat hundir, giliyê wî dikir.

\_kuro , Cemîl ma tu li lawê xalê xwe dixê , mane mêvanin lawo. dûre nahêlin tu here binxetê gundê wa girsor.

\_em dilîzin em heneka dikin , ez nema wilo dikim , Cemîl bersiv da . êvarî li hewşê rûniştine , mala axê bi çûn û hatine, navmalî diçûn û dihatin . oda axê pikpikî ji zilama . reşê hêdî hêdî xwe bera ser gundê Terê dida , şewqa lempa û çira , bi mirîtî dihate dîtin di kulek û pencerên biçûkre , tenê şewqa odê tîrêj jê diçû . ewte ewtê Kûçikekî ji rojavayî gund dihat , wek here diza . heyvê riya xwe girtibû , hêdî hêdî diçû ava . ji nişkve qîr qîr û hewar bi gund ket . hedû malê hasso û temo ketin singa hev . zû li ber guha ket go kurê hasso qîza temo revandiye . lê berî ku li hev bidin tiving û demaçan , peyên axê bi wan giyan. serpeye li wan da qîr got wan : hûn li kune, qey hûn hessabê Qenco axa nakin , zû bidin pêşiya min , axa şandiye dû we.

herdû aliya dest ji ber xwe berdan , tirs ket nava wan , Qenco axa birazyê Ehmedê Suleyman , axê omer , ku cin û hessin jê ditirsin . çend peyaw bi rext û tiving dora wan girtin ew birin odê.

42

di wê deqêde , deng ji odê biliya . zilamê herdû malan kum û koloz û şivqe ji serê xwe kirin , derbasbûn , silav kirin û rûniştin.

Qenco axa cihê xwe xweşkir , xwe kuxand, awir ji wan veda , hinkî ma , li peye omer nerî . çavê peye omer di nava serê wîde dilîst , simbêl badayî bi jorde , xincerek dirêj diberde , tiving di milê wîde, emir wan kir go bramberî hev rûnin mala Hasso dîware rastê girtin , mala Temmo yê çepê girtin . rîsipî nêzîkî axe cî girtin , deh peya bi çek devê odê zeft kirin.

\_Qenco çixare pêxist , peyivî . ez bala xwe didimê , her û her , kesin pêde tîn . ji bav û kala de sînor hatine danîn bo gundiyan û di bin baskê mede derbas dibin , lê kesê bixwaze ji bin baskan derkeve turba xwe bi destê xwe dikole . hilmek li çixarê xist , gotin berdewamkir : em eşîrin , mala Sulêman tu carî rê nedaye û nade hilweşandin û xirakirinê.

\_em xulamê tene axa , Temmo got , tişteki wilo tune,

\_başê dinav wede nexêrî çêbûye gerek hûn bîn cem min , ne li hev bidin rexta . îca ka ji minre bibêjin derdê we çine,

Hasso gotin bir , got : ez xulam , kurê min xwedê wî nehêle , sebebe

...

43

Qenco nehişt gotina xwe bibe serî , jê pirsî: başê , te çima keçik jêre nexwest , te hişt birevîne,

\_Ez xulam , Hasso got : min keçik xwest , lê bavê wê got : kuramê wê heyne di devê riya wêdeye , ji ber wilo got : ez nikarim keça xwe bidim.

Axa berê xwe da Temmo , got : Hasso rast dibêje,

\_belê axayê min , gotina wî bi serê xweye.

\_çima naxwe te qiza xwe neda birazyê xwe hemmo,

\_qurmiçyê , me kir û nekir , digot ez kuramê xwe nakim , ew wek birê mine . ev nêzîkî salekê em bidûdene.

axe berê xwe da Hamo gotê : teres , tu şerm nake , tu ne mêre , dema , qiz mêr nexwaze , gerek mêr ji xwere yek din bibîne , ne xelkê pev bide kuştin . Hemmo serê xwe bera ber xwe da , deng û his jê nehat . bavê Hammo , got : axa wî efû bike, nezane , cahile , kolê teye.

Qenco got : Hasso qelenê ku Temmo bibire tê bidê , bûk û zavê vegeînin li gundê Cibiltîne li mala çetîn xalanê Zaroka bi cîbûne ev mesele divê ez nema bibihîzim.

lê bi tirba sulêmanê pêşî yê ku ji we şaşıya bike ezê wî bidar vekim

.

44

zaroka çend rojên ciwan bûrandin li terê, dostanîke xweş peyda bû dinav wan û zarokê metka wande . lê roj zû buhurtin , gerek careke din vegeînin Hatxê.

li vegeîrê li ser benderê Hatxê pêrgî dawetekê bûn . bûk li ser hespê , hinarkê riwê wê û çavên wê yên şîn , xweş dibin şerpa tenikde, dihatin dîtin . komek ji xort û keç dora wê zeft kiribûn , bi çepik û stiran bi gel dengê dahol û zirnê gavê xwe bi bawerî tavêtin.

bûk dibirin mala zavê . wê şevê gundê Hatxê heta berê sibê xew nekir , dahol û zirne , lîlana qîzan qîr qîra xortan . li azmana stêrka diçirisand , te digo qey didin dîlanê li gel dengê def û zirnê.

wê şevê zarok , li serê bèn , li ber dengê mûzîkê xew kirin , Simko li stiyrikan dinerî, bidil kulî xewkir , sibe wê binxet bibin . ji xwere digot , çima em tim livir namînin , mala xalê wî , metka wî , rez , kew , dehl , kanî , wê bêrya wan teva bike.

wê sibê bi taştêre , giyan gundê Qesra . ji Hatxê hatin çûva berî dan Menderê.

xalê wan Ferhan , rêber Elo dît jê pirsî li ser binxetkirina wan , Elo got nîvro dema werdiya cendirma tê guhertin , emê binxet bibin , min pere dane qomîtanê wan.

\_yanî tu tirs tune , Ferhan pirsî.

45

\_na bavo na , Elo got .cendirmê Turk ez wan nasdikim , pera bide wan , turkiya gişî difroşin.

\_başê diya min jî , li gel weye , pîreka mezine , ha jê hebe , Ferhan, got.

\_kuro nepojin , te hîn çixara xwe , tewaw nekiriye em binxet dibin . \_ de ma xwedê , Ferhan got . tu pera ji wana nestîn , tu vegere , riya xwe bi min xe.

Elo bi dorbînê çavnerîna guhertina cendirman dikir . ji nişkêve dorbîn da alî got : deme bêjin ya xwedê , de em herin , xatirê xwe xwestin.

dem roje tirsê ew girtin , çimkî berî çend şevan cendirma û qaçaxçiya li hev dabûn teqandin . wekî din , di rojê de her tişt tê dîtîn . lê Elo ew kirin rêz û bilez xwe li xetê dan , zû sînor li pişt xwe

hiştin , ketin ser bänderê Dodan , rawestiyan , pîra Sarikê li pişt xwe nerî , keserek veda got mala te ava xwedyû.

li mala Ebdê Gedo bûn mêvan , piştî firavînê Doda berdan , berî dan gundê Xirabkortê û li mala Cemîlê Miqrî bûn mêvan . hîna şûna xwe xwşnekiribûn leşker bidû wande ket nava gund.

erdê nema xwedya malê hilanî , diçû bivirde dihat biwirde , xwe bi tepa reş û şîn kir hema digot : qirê Cemîl , qirê Cemîl

46

,te malka me li mîratê xist . lingê wê nema erd digirt.

\_rûnê xwakê rûnê , te xwe kuşt , kes te naşeniqîne , te dinya nedîtiye , Hessîna gotê.

\_qirê Cemîl qirê , te mala me bir mîratê.

dema leşker gund berda Mihemedê Seyid Silo û Ibrahîmê Hacî berî dan Qamişlo cem Ebdilbaqiyê Icmo mamûrê nifûsê.

piştî silav û xêrhatinê Mihemed gotê:

\_kirîv zarokê me asê mane li Xirabkortê , leşker bi dû mede ket gund , di me hildane.

\_ez kirîvê teme , kes dikare qarîşê te bibe , Ebdilbaqî got û bi wanre bû heval . Xirabkort berdan , her yek barê çar dewara xistin erebê û li gel Icmo berî dan Girsor.

giyan Girsor , hîn heyv neçûbû ava , bédengiyeke mezin xwe berdabû ser gund , şewqa lempa û çiran bi mirîtî di kulekanre dihat dîtin.

Simko , ji nişkêve got : yadê mine mine heyva me jî wek ya mala xalê mine.

diya wî kenî gotê : lawo giş yek heyve , ev û ew yeke.

metka wî Pero got : de bes lê ma çilo yek heyve , ma çilo heyva Hatxê ji vir tê dîtin,



Hessîna kenî , gotê : Pero tu aqlê xwe dike wek yê zaroka .wilo giyan devê deryê malê.

47

Hîna negiyan xwe vekin û şîvbixwin , civatê bi serwade , girt .çi meriv û çi gundî. çend şeva hundur vala nedibû . mewîj , benî , bastîq , nok li ber mêvana datanîn . dipirsîn li ser rewşa mervên jor , çi heye , çi tuneye , hineka pirsî mervên xwe dikirin . du sênîyên tûtînê , li ber mêvana dihate danîn.

şeva didwa , civat dîsa li ser jor peyivîn . xweska bi wan dema , em diwan çiyande , li serê kanîkan , weke şêra em dihatin xwedikirin , me nizanîbû tirs çiyê . cin ji me ditirsiyan . carekê me du cendirme , hêsîr kirin Salih got.

Mihemed kenî , got : Salih tu dibêje , tu natirse nayê bîra te çawa te ji ber Sebrî revî.

Ha\_ ha \_ha \_ Sebrî kenî , kenî êsra ji ken di çavare avêtin û got :ez û hacî Mihemedbûn, em bi serê kêş ketin me Salih dit darekî dirêj min xist ber noqa xwe , bû tiving , û tûrik xist serê xwe û min bi tirkî stira . dema Saliho ez dîtîm ma revk kir . kuro Saliho , kuro Saliho ez çiqas bandikmê , tu ji kêre dibêje car li xwe qulipand sêwiyê bigû.

\_ê dem xweska biwan deman , Mihemed got.

48

\_dema ku te Menca xuha Cirwa revand . Salih pirsî , ne eger tu girtibana , xwedê tenê dizane wê çi felek anîbana serê te.

\_me soz dabû hev li ser kaniyê , Mihemed got . ez hatim keçkê dixwest û nedixwest di tirsîya , lê min bi çeplê wê girt deng biwan ket go mi keçk revand , dan dû me . me xwe veşart di ser mere diçûn û dihatin , dengê wan xweş dihate me . bê hêvî bûn çûn.

roja din sibê me xwe nêzîkî gund kir me go belkî hinek xwarin bo xwe peydakin . dema keçkê diya xwe dît li bêriya , xwe ji xirbe wek xezalekê berda , ma ku ez xwe bidim alî.

Salih gotin girt got : kuro piştî çend sala ji vî girsorî Mihemed got : ezê herim mervê wê bikujim , rabû ez û wî çûn . tiving me da milê xwe , em taştiya gihan Hasdê . malek li pêşiya gund , derî vekirî , em derbasbûn jinek tazî di teştêde çav bi kef , zû bê deng em derketin . me go kuro vê por kurê , derî vekirî hiştiye serê xwe dişo . me li sînora da , em ketin dora wan . birayê wê yê mezin li hespê nêzîkî me derbas dibû , min tiving xist newqa wî , tilî danî ser zînadê wê rojê minê ew kuştiba lê Mihemed destê xwe li tivingê xist berê tivingê da Elî min got te em anîne heta vir,

49

çima tu nahêle , got : dîsa em pismamê hevin , ev kuştin wê nexweşîke dirêj dinav mede peydake . eger qencyê Mihemed hebin , ji xwe eve , Salih got.

Piştî , jêre çêtir ket , yek wek hessîna anî min jêre dît . dema hîn ez li cem Ehmedê Yusivko bûm , muxtarê Hatxê , tilîfona qesrê Zing zinga wê bû . Salih kenî got : Hessîna tê bîra te dema ê mihelmî hat ji mala bavê te telîfonî Cibiltînê kir got : elo elo Cibiltîn “ pêşmalkî Sarikê winda bûye we nedîtiye. , “

Em pirr westandin di mesela mehrê de , Mihemed got : baş çawîşê Stilîlê û Xezûrê min Ehmedê ?sivko çûn Kercosê , sîde dan wan , got: îşê vî zîlamî bimeşîne . du meha ez li Midyad û Stilîlê bo vî îşî mam. dostek li gel min bû , devê xwe bir ber guhê mamûr , bi dizîka bi turkî jêre tişteket got , serê xwe hejand kaxeta me mohrkir da me, hevalê min destê xwe avête bêrîka xwe pere derxistin , min destê wî da alî , min pere dan û em derketin.

Yella Mihemed bilezîne , hevalê min got : kûçko , naskir ku tu firare , em xwe ji van dera bidin alî , ez hatim Hatxê , min mehra xwe birî , Hessîna li pişt xwe kir min lingê xwe li mhînê da binxet tu likuye .  
li gundê

50

kuçik li mala Seyid Yûsiv bûn mêvan û diwire binxet bûn.

\_êh dinya . Sebrî got : ya xwdê bû wextê xewê . civat ji hev bela bû roja din , diya Simko deylê kir , jêre qeymax danî ser nan , gotê : lawkê min , berxikê te bêriya te kirine , wan derxe serê zadan.

dê berx alî Simko ajotin heta serê benderan.

xaniyên wan diket serê bendera bakurî gund . ji wir çiyayê toros û keleha Mêrdînê xweş dihatin dîtin . Simko berx ajotin , berê wî ket bareşî gund . nêzîkî riya Nêf bû. ji nişkêve dît tirimpêlek tijî esker peya bûn , şivanê pez li wir girtin ew danîn erdê nigê wî xistin qayişa tivingê û ew dan ber felaqa , qîr qîr bi şivan ket , eskera bi zimanekî di peyivîn , Simko têde nedigiya . tenê gotinek (yella ) naskir . şivan rabû , leşkera ew da ber pê nê û dara , û tirs xistin nava pez , bi bazdan berî şivan giyan gund. dema Simko willo dît , berx dan ber xwe zû hate mal.

\_çizû tu hat lawo , dê pirsî. !

\_simko got : esker , li xelkê dixîne.

\_eskerê çi , kî xelk , hîn willo dîtin tirimpêla esker hat devê odê . him him bi gund ket . hîn wilo , piyayek derket ser ban

51

û bankir : hê gelî zilamê gund zû werin odê . belkî berî ku ew ji serê ban bê xwarê, zilam li devê odê kombûn , ketin hev , ziq li devê odê nerîn . dîtin eskerek xwedî nîşan û çar nefer bi dûde ji odê derketin maqûl û muxtar bi du wande . Izêro muxtarê Gund got : ev

birêveberê navçê Amûdêye angò ( mûdûrê nahiyê ) wek ew nav li xwe dikin , hinik tembiyê wî hene , guh lê bikin û jêre bi erebî got : kerem bik.

mûdûr kinî dagirtî lêv reş û qalind , çav reş tijî kîn , zik tilêrî , demaçe diberde , qutekî dara di destê wiyê reşde .di hewşa odêre ber gundiya re diçû vîyalî dihat wîyalî bo tirsê têxe dilê wan.

gundîkî diber xwede go : kûçik bav çî zik li sere , têr mirîşke.

hiş bê deng , mûdûr got : piştî rawestiya peyivî.

\_gelî kûçika , guh li min bikin , ez bi navê yekîtiya Misir û Sûrya di peyivim , biryara min eve : ku paşî heftîkê wek îro divê yek mî - yek bizin li gund nemîn , bi sûnd , ez bê mî û bizanbim , ku yekî ji we gotina min bi cî nanîbe , ezê mala wî li mîratê xim , ê ku mîyek li cembe , ezê çar heqê miyê jê bistînim û wî mehekê girtin bidim û her weha gundî hemû.

yekî destê xwe hilda xwest bibêjê ku pezek kare dimalde bi nan xwedî bike.

52

mûdûr nehişt gotina xwe berdewam bike , got : bêdeng kûçikê teres , nehêl ez te têr darbikim.

gundîya li dora xwe nerîn madê wan hate guhertin , yekî dest avêt simbelê xwe , di berxwede got : bera xwedê nehêle.

dîsa mûdûr peyivî : ev welat di bin raya mede diçe , ê hustê xwe dirêj bike , wê hustê wî bê jêkirin.

piyawê gund li hev nerîn û serê xwe berdan berxwe.

piştî muxtar got : deng hat we , pez mez divê li gund nehêlin , tiştê dawî ji we tê xwestin , hûn temenê benzîna tirimpêlê dinav hevde bêşbikin.

\_bilez axe got.

gundiyên belengaz ketin hev , ji vir ji wir bo wan peren peydekirin.

\_meznaya xwedê ev nîv wereqe di binê bêrîka min de bû , ew jî min digo îro ezê ji zarokare şikir bikirim . erê meznaya xwedê , ewjî birin . erê welle , Xeto got û di ber xwede kenî.

\_Simko dinav zarokade li ber dîwarê dika odê , dinerîn . dema cêba leşkera ji hewşa odê derket di ber zarokanre çû , yekî ji esker berê tivingê da wan , zarok veciniqîn .di wirde hat bîra Simko çawa leşkerê turk hatin mala kalkê wî li Hatxê . dît çawa

53

milet ket hev li vir û li wir . dilê xwede got: ev çima leşker bi zimanê me napeyivin,

hîn wilo melle li ber dîwarê camiyê banda , dîwarê camiyê ê bareş li hewşa odê dinerî . zilama berê xwe dan limêja nîro . lê çend xorta pişta xwe dan wan , guh nedan bandana mellê.

\_ev tiştê ku tîn serê me , ji gunehê van xortaye , bûne gawir yek ji xityara got:

\_erê yabo dibêjin bûne partî , Xelê Hisko got : Hilalê Botiya serekê wane.

\_kuro qenc dikin , Ibrahîmê Hemo got : ji xwe vê misilmantiyê Mala me wêrankiriye.

\_hiş , dengê te nekin , meznaya xwedê wê te ji hev bixin , ezê Gulê got Ibrahîmko.

hîn gundiya şîv xwaribûn ya nexwaribûn Hussênê Edla mal bi mal digeriya digot : axe we dixwaze odê.

ode pik pikî . gundî xêrhatin dihevde didan , qotiyê tûtinê tavêtin ber hev dema Hisko derbas bû tev ji ber rabûn . Hisko hîn ciyê xwe xweşnekiribû , çixarek Firincî ji kertona wê kişand , çeqmaqekî nazik ji bêrîka xwe derxist , çixare pêxist.

\_tîq tîq bi Seyid Sebrî ket , kenî û kenî berê xwe da Xeto got : kûçkê bigû çeqmaqê xwe bavêj , ev deh deq tu duke pif pif tu nikare fitîla çeqmaqê xwe pêxe te dî çawa çeqmaqê axê wek demaçê Pêket.

54

\_xwedê ji te razî , em li ku û axe li ku, Xeto got.

\_axe di bin simbêlare beşîşî, destê rastê avêt simbêlê xwe û bi jorde bada . hinkî ma û got:

\_gelî gundiya , min ban we kir , ji bo ez ji were bêjim , divê ku hûn zû ji xwere çarekê Bikin , pezê xwe ji gund derxin biwere sê çar roj hene.

\_mele Cemîl , nigê rastê danîbû ser ê jêkirî dest avêt darê xwe kişand berxwe û bi tirs pirsî : axe , du bizin li cem minin , ma ezê wan bi kude bibim,

\_ew îşê teye . îşelle yekbe , tev divê derkevin.

\_axe tê pezê xwe bi kûde û kengî bibe,

\_pezê min !! ha – ha – ha kenî û got : pezê min bi cîkîde nare , ma hûn li min dinerin . ez axeme , kes nikare nêzîkî min bibe.

\_ê başe , axe pezê me bera nav ê xwede Xelefê Silto pirsî , bizin û mik mine.

\_ma ezê derewa li dewletê bikim . pezê kesî namîne li gund . gotin û pirs neman. axe got û rabû serxwe . rênçber pêve rabûn û pêre derketin.

wê şevê pîreka Mihemedê Seyid , ket ber halê xwe , berê sibê , bi arîkariya pîra Xensê , jêre law û keçek çêbû , zikê wê cêwîbû.

55

Mihemedê Seyid ponijî , go ka wê pezê xwe bi kude bibe , ev herdû zarokên piçûk, jin hîn dinav ciyade.

ban colika kir , got wan , hûn pez sibê ji sibêde bajon , herin Tilsitîh , cem mala xuha min . va disê Roja , Hessîna başbibe ezê bigim we

.

roja din şivan Selmanê Sofî pez derxist , Cemo û Helîm û Biroka dan kêleka pez û rê girtin.

wê rojê xwedê wilokir , Eyşa xuha Hessîna û mêrê xwe Sofî ji ellawî dihatin diçên doda , riya xwe bi Girsor xistin . Hessîna go xako vê keçikê bi xwere bib , va her disê meha , heta em berxwe bibîn . Eyşê zekokê Bir , paş sê roja , Mihemedê Seyid erebe girêda , livîn û firax û kon û tiştê gerek xistinê , tenê Simko li gel xwe bir û ê din hemû li mal hiştin . xuha wan Hemdiya ha jiwan hebû.

Mihemed erebe ajot , çûn Kevrê Sipî - girbawî \_ Til Mihemeda , li çem xistin û rawestiya , hinkî xwe rehtkirin , simko çû devê çem , dît şivên şîn dirêj û ciwan devê çem zeftkirine li wî alî qur qura beqa dihat.

\_tu nekeve çem lawo , dê gotê û lawkê piçûçik şir dida.

56

\_ma me nav li vî lawkî nekir , Mihemed ji Hessîna pirsî.

\_Mihemed ma ma , got navê wî bera Cemal be , ji bo em vê rojê ji bîr nekin.

\_vê rojê yan va roja , Hessîna kenî.

piştî nîro giyan , li Xirbê Sebha danîn . kon vegirtin , çêr pirbû , giya û şînayî , bêhna gul û kulîlka hawîrdor difûriya , can kêfxweşdikir . tolik , strîzerk , qinêber , qîvar , kulîlkê sor û zer û herweha geşbûn didan buharê . ezmanê şîn û zelal dil bi cî dikir . Simko û hevalê xwe li dora kona digeriyan diçûn çûka . ji nişkêve dît bavê wî û mala metka wî Pero û colkên gund tên , bazda pêşya wan , silav li wan kir , carkî din weke berqê berê xwe da bin kon xeber da diya xwe.

êvara we bixêr , mêvana silav dan ,dişa Hessîna Pero çû riwê wê gotê:

\_ma çima hûn nehatin gund welê,

\_Hessîna berî bersivê bidê li xwe zîvirî dît Helîmê Evdîko li ser lawikê piçûk rûniştiye.

\_waweylê , waweylê , Helîm te lawikê me fetisand , tu li ser Cemal rûniştiye.

\_Helîm zû rabû , paçik ji ser çavê lawk hilda dîtin rehetê . Helîm kenî go : te ew xistiye selkê wek pisîkiye . em diber Cemal divire derketine , we hîn navê wî jî lêkiriye.

57

roj hêdî hêdî çû ava , reşê xwe bera ser erdê da , kon û tarî bûn yek tenê şewqa fanosa dibin rewakên konade dihatin dîtin û dida zanîn ku li vê çolê kesin hene.

bêdengiyek mirîtî şev li xwe pêçabû navnavanre kewt kewta kuçika mêranî peydadikir û şewqa fanosa hêvî dida jiyanê.

Simko dinav ciyade ziq li steyrikeke bi şewq dinerî , bavo çixare dikşand dado kurkê xwe şir dida.

roja din bi taştiyare , şivan pez nêzîkî kon kir . pez komkirin wek gog , heçî kavir , gîsk û nêrî berdan . Simko serê pez ji diya xwere girt bi alîkariya colkan , mêr û jin . her sîtila şîr tijî dibû , diya Simko berdida beroşên mezin . carna bişkol ji dawa miya diketin , jina ew tavêtin . pez têrbû kayîna xwe di kir.

di konde , divê dê hinek şîr li ser papora gazê bi kelîne bike mast , û yê din fikir penêr , her sibe , pîkab dihat ew penêr dibirin Qamişlo difrotin.



Simko qeflek gulin zer komkir , dikir rext û kum , Bedranê Mele , hinek ji dest revand . Simko çû têra wan avêt ser kera wan got : yella ji cem me barkin.

Sûriya ca Bedran banê kirê , lo Bedrano ma dîsa çi tu girrê xwe di Simko dide,

58

\_diya Simko banê kirê , kurê min her tu û Bedran pevdikevin , tê têra wan bavê ser kera boz , tê bê barkin , mane bi mere hatine lawo , şerme.

Simko li diya xwe nerî beşî , destê rastê di ser porê xweyê zer re bir , tê ji ser kerê hilanî . kerê dibin çavanre lê nerî û dîsa devê xwe avêt giyê . çûk di ser hêlîna xwere bi dêhnîtî difiriya dikir çiv çiv , nerazîbûna xwe xuya dikir beramberî gavdirêjiyê li ser teyr û tilûrên çolê.

Simko û Bedran bi dû çûkade diketin , hêlîn didîtin . qîvar dixwarin, dilîstin . rokê dûrî kona ketin di binya xirbere bareşî kona kêf xweş dibûn , bi ciwanbûna erdê dinav gul û kulîlka de . dema ji nişkave dîtin komek zarokê ereba ji dora xirbe derketin û bi kanya hatin wan , xwestin heyfê Ji wan hilînin , herdûk wek bê berê xwe dan kona , car carna kanî tavêtin wan û dîsa direvîn , bêhn çikyayî ghiştin.

\_çiyê lawo , çima wiha hûn bêhin çikyayîne dê jê pirsî,

\_zarokê ereba bi kaniya hatin me , em revîn.

\_wejî liwaxista lawo , ma hûn revîn.

\_yadê , ew gelek bûn û em herdû bûn , du kanî çi dikin himberî deha.

\_wilo xebera teye.

59

Simko di dilê xwede , digo qey ew zarokê erebane ewên yê ku devê xwe anîbûn Girsor û rojekê şerekî mezin bi kaniya dinavbera wan û zarokên gund pêkhat.

Jiyana nû riya xwe dît , xelk fêrî cihê nû bûn , kon ketin cê xaniya , fanos ketin cê lempê , tifik ji xwere çêkirin , nanê sêlê ket cê nanê tenûrê.

li gel ku jiyana ne rehet bûjî , lê dilê wan pê xweşbû , çimkî intirnatîv nebû . lê rojê ciwan çûn xwê.

roja din bêrya , cêba esker bi serwande girt . li dora pez zîvirîn zenbûrê xistin , pez li hevket beroşê şîr dan ber xwe bi erdê dakirin . esker xwe çemkirin piyawa ( zilama ) bi gotin û şor ew dan ber dara. wilo bavê Simko li ser hespê dihat . got : ez xwedyê pezim , yê vana tu sûcê wan tune.

\_navê te çiye , esker pirsî.

\_Mihemedê Seyid Silo.

\_esker serê xwe hejand û pirsî : tu ji kuwe,

\_Girsor.

\_ev çi nave , bi erebî jêre çi dibêjin,

\_jêre dibêjin “ til ehmer. “

\_ha îca ez têgihîştim . ne wek zimanê we yê çewte.

\_başê , du roj din ez tîm , divê ez we livir nebînim.

\_ma emê bikude herin,

60

\_herin cehnemê . ev ne îşê mine û cêb ajotin.

\_ev segbavana bela xwe ji me na vekin . bi cîkîve em narin , ya em ya ew ! hûn çi dibêjin , Mihemed pirsî.

\_ez dinamûsa wanîm , em narin tu derê pismamê Mihemed Mehmûdê Seyid got.

\_Helîm kenîya , got : birako ewqas qîj qîja te bi derewa çû . roja Nasir hat Qamişlo , te digot “ aş aş cemal “ ango “ bijî bijî Nasir.”

\_ma ez ji ku zanim , min digot wê qezencê bigîne me . Mehmûd bersiv da.

\_nikarin tiştêkî bikin , Biroka got.

\_bê bavî karî hertiştî bikin , Recebê vegerand.

\_ezê meznê van gunda bibînim , dibe bela wan ji me veki . divê em li ber xwe bidin . ev çend roj derbasbin , zad bîn çinîn , wê dev ji me berdî hingê em dikarin vegerî gundê xwe.

de ma xwedê , yekî got.

wek polîs got paşî diroja hatî , diyare li ser wan danîbûn . vê derbê çîte kona dan alî , kon bi ser zaroka û jinan de berdî . piyaw tev girtî , di newalêde ew daxistin , tirs di wan firandî , zirt liwan kirî , gotî: emê we bavên hebsê û zarok û pezê we li wê çolê bihêlin.

61

Mihemedê Seyid got : efendî , em hatîne bo demeke kin , ma emê kude herî . hûn çl dixwazî ,

Peren derxistin dan dest . pere birî ew li wê çolê hiştî û çûn . zilama li hev nerîn tîq tîq bi wan ket . yekî got : siwar çû peya hat . dan dû hev vegerîyan bin konên xwe . bi wî rengî , lîska pisîk û mişk hete demekê li gel polîs hate berdewamkirî . lê paş demekê derdekî mestîr bi ser wande girt.

rojekê ji rojê buharê bê deng û ciwan , pişt nîro , bavê Simko ne li malbû , apê wî Mehmûd û çend zilama çayê li bin kon vedixwarî û belabûn , hîn nuh diya Simko qedeh û çaydanê çayê hilandî kêfxweş dibûn bi wê roja xweş . ji nişkêve , reş û taryê girt ezman , tirs peydakîr , diya Simko gotê : were lawo alî min rewakê Kon deynî , li bareşê kon herdû sekinîn , dê gotê : her kurkêmi qurban

tevşê me li cem mala apê te ye zû bîn û wer .Simko wek berqê berê xwe da konê ku diket bakur rojavayî konê wan.

lê berî Simko bigê bi bîst gava , zîpikin mezin kesa nedîtî wek fîşeka hatin xwarê . Simko her beziya û dest dida ser serê xwe û dihlanî ji êşa zîpika , ber bighê bi çend gava apê wî Mehmûd xwe çemkirê rahiştê revand . çawa li pişt xwe nerî , dît konê

62

wan biser dê û birayê wî yê pêçekê hate xwar . tirsê girt ser kona . dema tav derbas bu , roj derket , pêre xelk jî ji bin kona derketin , lê kon û firax û cil tevde di bin avê de man.

hîn willo , dîtin hewar ji gund hat bi wanve . bavê Simko û xwarzyên xwe û çend zilamên colik . bi rêde ji kona heta gund bi deha laşê pez dirêjkirî wek cendekê leşker di erda şerde.

xwedê mala Nasir xerabike.

xwedê netebayî îşê wan be.

bavê Simko bi qehr got.

ma te nego Nasir û hevalên xwe weke me di bin zîpkadene , Biroka bi ken got.

wilo giyan çemê lehiyê . nigê xwe hildan, kirasê xwe li xwe gerandin , û li çem xistin. Ebdilezîz rahişt lawê xalê xwe Simko û diya wî li hespê , çem qetandin çûn mala Perro , ber soba germî digotin petepika.

derdê wan ma pezê wan . wê rojê û roja din geryan ne geriyan pez nedîtin . z tevde dibin zîpikê de hatiye kuştin . çimkî bi çavê xwe seda pez kuştî dîtin.

tebata Mihemedê Seyid nedihat , digot : pez çû çû lê lawkê xelkê hema tişt pêneyê . hîn willo Cemîlê xwarzê bi bazdan , mizgînî anî got va pez dîtin . kêfê tev

63

girtin, bazdan derve . dîtin siwarek li devê deriye dipirse:

\_kî Mihemedê Seyide,

\_ezim , Mihemed lê vegerand.

\_mizgîniya min li te , pez û şivanê te li gundê mene , hemû saxin selametin.

\_mizgîniya te ya xêrêye.

\_rabûn çend zilam li hespa siwar bûn , çûn pez û şivan Selmanê Sofî birê Evdîko anîn.

\_ê Selman lawo ka ji mere bêje , çawa tu rizgar bû , Mihemedê Seyid jê pirsî.

got beranê te yê kûr , ez û pez rizgarkirin bi zîpik û baranê re pez li hev komdibû serê xwe dixist navhev , beranê kûr jinav wan derdiket û pez dida dû , û bi vî rengî . ezê aniya wî maçîkim willo hete em li gundekî rasthatin jêre digotin “ Idrîsî Doşo “ kesin seyidin , hatin bi meve pez bi cîkirin , êm danê , û cilê min guhertin û xwarin dan min li ber agir . heta me ji were şand . qey ocaxê te hatin bi hewara meve.

lawo qey rojekê me qencîk bi feqîrekîre kiriye , xwedê tu û pez stirandin , em li ber te diketin . divê em qenciya van camêra vegeînîm qenciya wan mezine.

paş du hevtiya , barkirin berê xwe dan Girsor , dîtin ku ava çemê ceqceq piçkî daketiye . ji dûrve girê gund hate dîtin.

64

\_ew çi gire Simko , bavo pirsî.

\_wa ma ez nasnakim , bi xwedê ew girê Girsore.

\_eferim.

\_ço ço bavê Simko qamçî avêt qantira.

dolabê erebê , hêdî hêdî digeriyan , gav bi gav nêzîkî li gund dikirin

.

newala pišta gir tije avbû , lê tirabêlk peydadibû , çimkî dem , bi alî havînêde diçû . bênderê Girsor şîndikirin ji giya li kêleka gir mekîna zad di nav çaboxekêde zad diçînî . kerekî mekîna sê dolab dikşand gergerok zad dikir qefl û tavêt . wilo xuh û birayê Simko hatin pêşiya wan dê peya bû . zarokên xwe hêmêzkirin.

gundî wek gêrikê dixebitîn . sibê ta êvarî. şev û roj . kar li pêşya wan pirbû . jina piştyê pûş ji çolê tanîn serbêndera , hineka bi erebê xwe pûş dikşandin . piştî gerek genim û ceh û nîska bidara bikotin , yan dewara di ser re bibin û bînin , yan bi cencerê Gêre bikin , piştî di dêran , zad başqe dikirin ji pûş û kayê . qût û bizir dixistin çala . zad biker û qantira û ereba di birin aşên Topiz û Girbawî û Sinceqê dikirin ervan , bi şev keça ka bi şalka dikşandin kadîna bo pez , xortê ku karîba qurîncekekê Ji qîzekê bide xwe pehlewan didît û nav dixwe dida.

65

paş demekê jina bi alîkariya mêra genim di distade dikelandin bo burxul . dema ku çêdibû zaroka danûk dibirin . kerekî ne rehetê , ev ji bîra dikşandin kuîz bi kuîz dist tijî dikirin . agir bi tepik û dep û pûş dixistin bo kelandina danwa . dûvre danûk der dixistin ser bana radixistin . dor înekê tev didan heta ziwadibû . piştî dibirin êş.

êvara jina destar dihêran qûtê xwe hazirdikirin wek nîsk û danik û hûrik û savar. carna xorta alî jina dikirin û stranê destara tavêtin ber hev.

di wê tevlevêde , Nofka û kurê xwe Biroka berê xwe dan bêndera Mihemedê Seyid.

\_qewet be qewet be , xwedê bistrîne genmê te wek zêre.

\_rehmel bavê we , Mihemed li wan vegerand.  
\_xêre Nofka Mihemed jê pirsî , hûn ji xwe hatine , ya gerekbûnek ( pêwestiyek ) we heye,  
\_em bi îşekî hatine , Biro got û kenî.  
\_ser çava ku ez karibim , ez we vala venagerînim.  
\_em hatine ku tu erebê bide me , Nofka got.  
\_xêre.  
\_mane emê herin yekê ji Birore bînin.

66

\_serxêrê be , te çima wilo bê deng daweta kurê xwe çêdike, Hessîna pirsî,  
\_ne xwakê , ya ku em bînin qîza xalê wîye, emê ji serxetê ji Cibilgirawê bînin emê şêrîne bikin berdêlya şikro . em newêrin bêjin , ji hukûmetê ditirsin.  
\_yanî berdêliyê , Hessîna got , û berdewam kir : belengaza şêrîne nema tucarî vê binxetê dibîne , ji min bipirsin.  
\_ma em çibkin . xwakê , ma tu , ma ez , ma yadin , yadin , xwedê wilo kiriye , wilo li ser anya me nivîsîye.  
\_serçava hatine Mihemed got , erebe ereba weye . kengî dixwazin hazire.  
\_me go berê sibê zû , Biro got , ezê xuha xwe bibim ber xetê , wê bûka me daxin , û ya xwe bibin.  
\_kengî tu tê were , serxêrêbe li xwe miqatebin.  
piştî ku çûn Bedîa ji diya xwe pirsî , gotê: yadê berdêlî yanî çi,  
\_du bûka pev dugherin , jêre tê gotin berdêlî.  
\_mane qîza xaltîka min Navê wê berdêlye! Bedîa dîsa pirsî,  
\_erê keça min , mane ewjî dan bi jinekê Ji birê wêre , û ji wê çaxê ve navê wê ma berdêlî.

\_berdêlîtî bikêrnayê . Hessîna got , va mala kermêtî , her bûka wan dixeyide , qîza wan

67

jî tê . eger yek û mêrê xwe li hev nekin , îşê Ya din jî têk diçe , dikevin ber gunehê wan.

roja din berî nîvro , dema gundiya karê rojane dikirin , ereba Nofka hat dîtîn ji aliyê gundê Kotyave , hîn negiyabûn serbêndera , Nofka xwe ji erbê çemkir û bi dîlan û çepik û lîlandin da pêşya qantira , dismalk di destê xwe tavêt viyalî alyê din , gundî çûn pêşya wan ,jina lîlandin.

\_ax Nofka tu willo qotikiyê , tu hulqasî dibin erdê deye , te qîzek ji Cibilgirawa me anî , Hussênê Hemê gotê.

\_Nofka çû bi alîde , lîland , gotê quncir dîlanê bike.

\_hey cegene , Hussên gotê û diranê wî beşkirin . “ qîçkirin“

gava erebe giya devê derî , bûk û buxçika wê daxistin . wê rojê şeva gundiya li ber deryê mala Nofka yê belengaz û biçûk derbasbû.

rojê germên havînî barkirin , cî dan payîzê . çûk û tilûr birefa ji bakur difirîn başûr . şivana pez zû tanîn guhera , serme hêdî hêdî xurt dibû .gundiya cê xwe ji derve guhertin hundira . dema cot hat.

diya Simko gotê rabe lawo , taştiya bavê xwe bib jêre , li erdê meyê aliyê gire , dema Simko giya , dît bavo bi destê çepê kiras girtiye û bidestê rastê (tov )tavê erdê,

68

xwarziyê wî Ebdilezîz bi dûde haletê bi gîsin erdê radike.

Simko çû halet girt û çokir qantira , Ebilezîz halet berda û tîq tîq pêket dema dît halet bi alîkî bû . bavo ji wirde dibin simbêla re kenî

.



qantir vekirîn birin ser çem piştî av vexwarin anîn ceher xistin serê wan . ew ji ser taştiya xwe rûniştin : mast , nîvişk hêkê kelandî , nanê tenûrê . bavê Simko hêk diqesartin û beşişî li Simko nerî gotê : wê salê apê te Hesso cot dikir , ji nişkêve bazda bû hewar hewara wî , bazda bazda , dûre dibin çavare li dû xwe nerî dît terîşka paçikê zad bi dûde dikişkişe , kenî kenî , gotnê çi bela teye Hesso , got min digo qey mare.

nişkêve kerwanek cêbên sipî û ciwan riya gundê Nêf girtin . eew çiqas tirimpêl , Simko got.

\_ev elemanin lawo . ev çend salin li vê beriya me dirin û tèn , tirimpêlek jiwa bo xwêye û yek ji bo xwarinê ye.

\_ma li çî xwe digerin xalo , Ebdilezîz pirsî.

\_xwarzê , evana li erdê dinerin , dikolin , li kevira dinerin , heta bizanibin çi li ku heye.

69

\_Ebdilezîz destê xwe li pişta Simko xist kenî û got : tijî wek elmanaye çav şîn û por zer.

Paş demekê ewra hev girt , bû reqreqê tava , baran ji erd û ezman dihat xwarê . gêrik û kurmkên çolê , mar û marmarok tevde ketin qulê xwe , dem dema xewêye . çûk li cihê gerim û ziwa digerin . pez ma di hewşa de , sê dan bi ka û ceh dihat êmkirin. ger êdî zehmete ji av û heryê , gol û newal hêdî hêdî tiji av bûn . zivistan li gunda tenê civatin.

şivê zivistanê pirê cara kutilk û şamborek ya girar û goştê dermalabû . piştî şivê civat li mala bavê Simko pêkdihat . soba tepika germî dida hundur diwê çixara ode dagirtibû , çayê hate berwan , civat diwenisî.

\_ma îro baran hat ! , sal bixêr û bêre îşele , Ibrahîmê Hemo got.

\_kuro bêxwediye peze min tu dibê qey ji mehlê Hatîye , Turkî vegerand.

\_Sebrî kenî , got : Turkî qey tu peze xwe têrnake kuro.

\_welle yabo têrnakê!!

\_na a xweş xaniye Biro ji anhade dilopa dike Helîm got.

civat hinekî bêdeng ma , yekî ji wirde pirsî : anha pîrebok vî çilî çawa dikan,

70

Mihemedê Izêro cê xwe xweşkir gotin bir û got : mine birazî , pîreboka ji me kêftir kirine , ewjî wek me malê wan hene , xwedî jin û zarokin . wekî din ew dikarin xwe veşêrin , dibe ku anha pîrebok bimere dicivatê dene , em wan nabînin , lê ew me dibînin . dûre mala ku pîrebok tê hebe xêr têde pirre , carna tê bibîne çewalê ardê te bereket ketê , ew ji ku tê , pîrebok bereketê dixinê mîna pîreboka mala Seyid Silo hebû , newlobû xwakê , berê xwe da Hessîna û pirsî.

\_ma ez ji ku zanim keko , hîn berî ez bêm digotin pîreboka me hebû , dibêjin şevê pelê pêçayî ( heprax ) jêre xiştibûn bin sifriye wek her roj . dibêjin wê şevê pîreboka me xeyidî , gotiye çima serkolê kera jiminre danîne wek şîv.

dîsa Mihemedê Izêro gotin girt : carekê zilamek li mehîna xwe siwar , nêzîkî gundê Tilerbîd , ji nişkêve dît pîrekek xweşik li pêşya wî rûniştiye.

\_roja te bixêr xwakê , zilam silav lêkir.

\_bixêr û ser çava.

\_tu kiye , bikude diçe,

\_ez dirim vî gundî , ez hinekî westiyame.

\_were were siwarê , ezê pê bitere herim.

dibê hîn wilo mêrik li xwe zîvirî ne jin û ne min . dibê tirsê ew girt li mehîna xwe

71

siwarbû û ajot . li gund jêre gotin , xwedê ji te razî ew pîrebok tim li wire . li veogerê mêrik riya xwe guhert . dûre werin newala Avgîrê û Hêrikê Elî- fero çiqas car pîrebok têde htine dîtin.

\_mele Cemîl xwe avêt nav gotinê : carekê ez li kera xweyî bozim , mi dît pîrek li devê newala Avgîrê rûniştiye min gotê : pîrê tu çidike li vir , got : çavnerîna kurê xwe dikim , gerek bihata pêşiya min , min gotê : pîrê tu dibîne ez seqetim , were li pişt min siwarê Hîn wilo pîra min û te nebedî bû.

\_Berhê Izêro , keniya , got ew pîraya wek Sibhiyaye.

\_Nayifkê Kermêtî got erê bi navê xwedê bi zimanê xweyê lal got : lû lû ew pîr wek jina min Sibhoye , ku tu anha Sibho bibe wê newalê , ê ku wê bibîne wê dilê wî bêşe. mane kûçik bavê Erebe , reş wek pîrebokaye.

\_yabo bi mire cirya , carekê ez giyam hêrkê Elî fero midît karek diwê newalê deye . ez daketim ku ez rajmê Go wer yabo wer bi gûnê xalê xwe bilîz . yekî ji wî alî got.

mesela va cina tişteki sêre , Ibrahîmko got : min bixwe guh li çîroka mala pîrê kiriye , we tevda bihîstiye , di bêjin peyakî mala pîrê ji Hacî nasir dide rê , wê bê Girsor û xwe bera jêrda, dibê Kotiya

72

derbasdike , pêrgî sofîkî û qîza wî dibe û bihevre dibin heval.

li newala Kotiya , hinekî xwe rehet dikin , destê xwe dişon . sofî ji Birê Pîrêre dibê , tu naxwaze qîza min li xwe mehrke . Biro bala xwe dayê keçek wek heyvê , dibê başê û lê mehdike Girsor derbasdikin , sofî dibêje îca riya min ji awe vedqete û berê xwe dide riya

Girdêwan , Biro û keçik berê xwe didin riya Qotkê û nema xwe dibîne . tu nabê dirin çayê şingalê û diwêre derbasî çiyayê bagokê dibin û dikevin van çiyayê me yên jor , sala wî diqede şevê gur jina wî direvînin û keçik dike qîj qîj hewardike, dibê diwirde Biro bixwe dihise , dibîne cil qetyayî rî û por bûne yek , nenûkê wî bûne wek yê hova , xwe nêzîkî gundekî dike jêre cila tînin , porê wî jêdikin û çîroka xwe ji wanre dibêje paşî vedgere gundê xwe.

\_dibe mêjîyê wî lihev ketibû , li ber çavê wî pîrebok çêbûne , Hilalê botî got tîq tîq bi xorta ket.

\_bixwedê te li dilê wê da , Berhê Izêro got.

tişteki tişteki tîne bîra mero Mihemedê Seyid got , di bêjin carekê yek ji mala xwe derket bi keryê pezê xwere diçe , bi çi rengî di bîrekê werdibe mehîna wî tê mal , lê geriyan ne geriyan ew nedîtin xêra wî dan sala wî qediya rojekê mar terya xwe xist bin û ew avêt derveyî bîrê , ew jî wek

73

yê mala pîrê potkê wî dirizin , rî û por yeker dibin nenûkê wî wek yê hirça dirêj dibin , dibê ji bîrê derket dît pezê wî ravedaye wek çarîka di bîrê werbû , ban şivan dike xwe pê dide naskirin , dibêje ma ti min nasnake ez filankesim , dibêje here bédeng cilna ji minre bîne , porê wî dibire xwe pak dike û tê mal , wî nasnakin : yan bawernakin ku ew hîn saxbe . radibe çîroka xwe ji wanre dibêje , dibê ez ketim binê bîrekê kaniyek avê têde diherikî , li ser tehtekê min cih girt , dibê ziyakî mara di binê wê bîrê debû min saw jê girt . dibê wî marî zimanê xwe li tehtekê dida û li min dinerî , ez tê gihiştim ku ji minre dibê bux . dibê dema min tilya xwe li wê tehtê da min xist devê xwe ez têr dibûm , hingî şêrîn û xweşbû û bi wî rengî ez mame sax , heta mar îro ez avêtim derveyî bîrê.

\_çîrokek xweşe Xelefê Silto got.

dema civat belabû , hişê Simko ma li ser cin û pîreboka , nexasim yekî ji civatê got , dibe ku pîrebok dinav mede hebin . piştî lempe hûrkin û razan , dereng Simko dît di reşêde siyek di sere çû , bêhna xwe girt , bû kut kuta dilê wî nizane çawa dixewre çû , ew sî di mêjyê wîde cî girt heta demeke dûr û dirêj.

74

roja din axe şand dû bavê Simko di orta xwe û wîde gotê : hinek xort di gunde bi agir dilîzin , kesin ji derva dixwazin gundê me li hevxin , ez piştî xwe bi te xurtdikim , ez baş dizanim dema tu li piştî mibe , tu kes nikare tiştê bike . bavê Simko tê ghişt ku axe naxwaze civata li mala xwe kombike û tiliya xwe bi alî Hilalo vedike.

bavê Simko got : axe tu kes nikare li ber te rabe , em bi terene heta dawî . wilo got ji dil , ji ber kesin gelac di gunde li ser du werîsa dilîstin , ji alîkî ve digyan partî û ji aliyê dive hertişt digihandin axê ango du rû û du ziman bûn , ew tevger ne ji meralê Bavê Simko bû

.

lê bavê Simko paşî demekê , aşkere mineta axê avêt , ji ber axe dixwest kesna ji gund derbike . paşî lawekî ji lawê axê yekî gundî da ber şiva ji bo gundiya pê bitirsîne.

bi wî rengî , ew bû berberê axê yê yekem, mala xwe ji gundiya kir ode , herkesê ku ketin benda wan dihatin civata wî . çayê , çixare , qehwe dida gundiya , nema çûn oda axê.

wekî din , bidizî diçûn civatê partî ê ku piraya wan di despêkêde li çolê pêkdihat . Mihemed bû berpirsiyarê gundiya . piştî çend meha dema dost pîrbûn , şevêkê

75

dereng kadirekî ji partî simînarek gelekî bidizî bo wan çêkir têde got  
:

gelî gundiya , gelî hevala , em îro komdibin bihevre , da em bizanibin  
, kîne em û çî ji me tê xwestin , ezê bi kurtî jiwere bêjim dûre yê  
pîrsê wî hebin dikare bipirse . kadir rahişt pênûsekê û pelek danî  
ber xwe û peyvî û got:

em kurdin , welatê me kurdistan hatiye beşkirin di nav çar welata  
de , komara mehabat li kurdistanê îranê paş şerê didwa dor salekê  
jiya , lê ew jî hate perçiqandin . milletê me jibo biserkeve û bigê mafê  
xwe divê bi zanebûn û rêxistin bi xebite . bo vê yekê ev du sê salên  
ku partî hatiye damezirandin , em hîn di destpêkêdene , lê hêdî hêdî  
emê pêşve herin.

hinekî rawestiya û got : îro roj çî jiwe tê xwestin , çavê civatê vebûn  
, û tevda guhdarî wî dikirin , eger derziyek avêtiba , wê deng bihata  
, cara yekêye tiştê wisa dibhîzin.

\_berî her tiştî divê kes heta jinê we bi va civata nizanibin ji ber em  
hîn qelsin û dijmin xurte . ji me tê xwestin , hevala pîrbikin û ha jihev  
hebin û hûnê mehê carekê rûnin , berpîrsiyarê we ji anha pêve wê  
Mihemedê Hessenê Mistê be yê ku pîrsê wî hebin kerembikin.

76

gelek pîrs hatin kirin , ji wan yekî pîrsî got : çîma hûn gundiya tevde  
komnakin û van tiştê ji wanre na bêjin,

kadir kenîya hilmek li çixara bafra xist û got : bine ezbenî di  
destpêka gotina xwede ez ser rêxistinê rawestiyam . çîma , ji ber  
em ne eşkere dixebitin ev gotinê me derkevin yanî em hatin  
naskirin , wê çaxê dijmin dikare me tevda bi rehetî bide alî.

dibe ku kesin ji we bixwazin bipîrsin dijmin kîne , ezê ji were bêjim  
, dijmin ewe yê ku naxwaze em şiyarbîbin û bimînin bindest û razayî

wek rijêmên serdest û hinek ji axa û şêxa . ev gotin gerek ji hev bêne vekirin , lê hêdî hêdî , careke din çî pirsê we hebin wê ji were bên gotin . îca bi destûra webe divê em herin.

\_hûnê bikûde vê şeva reş û tarî herin baran ji erd û ezman tê , tûn tilya diçavê hevde rakin kes kesî nabîne.

\_çênabe em li gund xuyakin , sibe em bên naskirin , roja din wê mebahis biser gunde bigre , tê têkeve pirka me.

\_ji xwe şevê reş bi kêrî me tên , yekî ji kadirra got û pêre kenî.

\_hûn dizanin wilo barê min sivik dikin , xwedyê malê bi ken got. qapût li xwe kirin dismal dan serê xwe , potîn û bot xistin lingê xwe û derketin.

77

bavê Simko ji gundiyare got : mine kê pirsî tev jinê mejî , bê hûn li ku bûn . emê bêjin , we bi oçliya dilîst.

\_bixwedê te li dilda , ez mabûm heyirî ka ezê çî ji jina xwere bêjim , yekî ji wan got.

\_heyla pepûkî erê welle.

dema axe û kurê xwe naskirin go gundî roj bi roj ji dû wan vedgerin , û civata wan nema wek dema tê gerandin , xwestin tirsê di xelkê bifirînin . dest bi mehna kirin , her demekê yekî reben bê xwedî didan ber şiva, da ku tirsê peyda bikin û tirsê têxin dilê gundiyan . lê qet wan bawernedikirin ku îca gundî wê dara di riwê wande rakin .

wekî din , êvarekê , axe peyak şand dû bavê Simko . piştî hinek pojandin bavê Simko qundere li xwe kir û berî da odê . lê berî derbasî odê bibe , navmalî çavnerîna wî fikir û berê wî da xanyê malê bi xwe.

axe hat pêşiyê , xêrhatin tê da , li rewşa wî û zarok û pez û dewarê wî pirsî . paş qehwa tal vexwarin axe hinkî ponijî got:

mine Mihemed mala we cîyekî taybetî didilê mede heye , ji dema Seyid Silo rehmetî û ta îro roj . tucarî min û zarokê xwe dilê we nehiştiye , gutina xerab ji were nekiriye ,û tim singa odê ji wereye û ez venaşêrim ji te ku piştî min bite û mervê te xurte , jiminre hat gotin ku tu serokatiya benda gund dijî min dike , û

78

dan û standinê Te bi partîre hene , hîn tişt nebûye, ez dixwazim dîsa wek berê em lihev vegezin û cihê te hîn parastîye , û tu çî dixweze ez li ber teme , te erd divê , te çî divê bêje , bes tu şerê min neke.

Mihemed zû bersiv neda , ponijî , nizane wê çî bersivê bide ji aliyê dive , gotina kadir hat bîra wî ku hîn dem nehatiye em xwe eşkere bikin , lê divê rastiye bêje , belam çawa , Mihemed got:

tiştê te got axe , tev biserê xwene , ez te sipasdikim . ez dizanim ku em li cem te buhane , ji aliyê xwede , me jî kêmanî nexistine aliyê te , dema şer dijî dijminan yan dema me digirt ser gunda û ser eşîra tim me xwe dida pêş . lê dibe ku dem îro nema ew deme.

\_çilo , axe biveciniqandin pirsî.

\_ezê ji tere bêjim çilo , Mihemed gotê . îro roj hukûmet dest tavêjê problêmê me , carna kesna digrin , wekî din berî demekê pezê gundiya tevde ji gund derxistin yê te ma û tu li ser gundiya nexeyidî. xuyaye dem tê guhertin û em nizanin çima!

axe dest avêt simbelê xwe û dûr nerî got : tu guhertin çênebûne , xelk bidû rewrewkade dibezin . bêhnek da xwe û got: bi tirba Birê Xelo yê li ber min rabe wê bê perçiqandin.

79



bavê Simko bêhêvîti di nerînin axê de dîtin , di dilê xwede got : ev zirtên paçikîne.

eger lehî rabe xurt û qels dide ber xwe.

\_ha Mihemed tu bikûde çû , tu bîr li çî dike , axe jê pirsî.

Mihemed veciniqî , na na ez bitereme axe . ez guh li te dikim.

\_başê nerîna te çiyê,

\_ma nerîna min wê çibe axe , dem nema demên êrîş û talan û sergirtinêye , lê kengî metirsî hat ser gund , emê tevde bidestekî liber rabin . willo dengê bandana eşayê hat, axe got : ka em herin mizgeftê . Mihemed qundera xwe li xwe fikir û dil xwede ji xwere got : mêj û mizgeft mirtalên di dest wande , her qels dibin , millet pê dixin destê xwe , Nofa xatûn , jina axe ya mezin , bîr û fikrin Mihemed birin dema derbasbû û got : bine Mihemed piştî me bite û merivê te xurte , em bi te bawerin . Mihemed beşîşî got : tiştê xwedê kirye wê bibe . xwedê mezine.

rêncberê axê bi fanosê da pêşya wan , berf bi qefla dihate xwarê.

mizgeftê Ji aliyê rojavade li odê dinerî . piştî mêjê , mêjkera berê xwe dan odê . dîtin xort bi hungulîskê dilîzin.

\_dicê ku hûn bên mêjê hûn bi hungulîsk dilîzin kalekî pirsî.

80

\_sibe êvarî wê Nêfî bên bimere bi hungulîskê bilîzin , em pirova dîkin , Farisê botiya got.

\_bê çiqasî qurebûne “ pirova “ axe bi qehr got:

\_xûziya xort diberde ma , xwe qurnisand.

piştî civat rabû Mihemed pez êmkir , derbasî hundirbû dît pîreka wî hîn şiyare.

\_te hîna xew nekiriye,

\_na , va min ji tere , gorak hiriyê tamam kir , sibe li xwek , dem sare.

\_destê te saxbe , lê min digot qey te xewkiriye . tu dibê qey ez hinekî birçîme.

\_pîreka wî rabû zû bapor pêxist çayê danî ser hinek qelî germkir danî ber û jê pirsî:

\_axe çi dixwest , şandibû dû te,

\_axe naskiriye ku tejik ji bin nigê wî tê kişandin û dem têtê guhertin, ji min dixwaze em wî bernedin.

dema qelsdibin xwe nêzîkî gel dikin , dema xurtdibin jê dûrdikevin

.

\_hima çibe tu tim xwe dide pêş .te ha ji xwe hebe , bizanebûn her meselê , jinê gotê.

roja din sibê , Hesenê Mero çû ser bên , bankir ji gundiya xwest bên xaniyên axê paqijkin ji berfê û gundor bikin.

xort derketin jora xaniya bibêra berf ji ser waqas xaniya avêtin , ka kirin , û

81

gundorkirin . piştî gundiya yê xwe jî gundorkirin.

zaroka bûkê berfê çêdikirin û sîpa xefk bi rêxê li ber çûka vedidan.

nîrokî bavê Simko gotê her lawo bera apê te Sebrî bê firavînê bixwe

.

firavîna wan girar û goştê dermala bû , û hinek kutilkê duh mabûn

.

Sebrî , got goştê çêleka we di devê merode dihile.

\_xweşî be.

ava germ ji ser soba tepika xistin misîn , Simko li destê ap û bavê xwe kir , bi sabûnê dest û devê xwe şuştin . çaya xwe vexwarin , çixare dan hev , dûre Mihemed got:

\_tu zane Sebrî şevêdin axe şand dû min.

\_çi dixwest,

\_bihna xwe fireke , ez pêde têm . Mihemed bersiva wî da û pêde çû got:

\_tirs li axê peydabûye , li ber guhê wî ketiye ku tevgerek dijî wî tê kirin ji me dixwaze em jêre bibin mortal û pişt , ew baş dizane ku em jêre bibêjin erê kes nikare serê xwe ji nîr derxe . ez bi diblomasî çûmê , lê em nikarin bi şûrê wî li gundyaxin û riya kadirin partî ji gund bibirin û nexasim me dostanî daye wan.

82

\_axe hîn xurte , divê em lezê Nekin û bizanebûn herin meselê . me serê xwe ji kesîre nizimnekiriye û nizimnakin . Sebrî got:

piştî çend rojekî berf hilya , erd hinekî ziwabû , dereng dengê deryê derve hat bavê Simko çû deryê hewşê vekir dît deh siwar qaçaxçî li devê derîne . xêrhatin diwande da , got wan kerembikin.

serekê wan Enwer beg got : bise heyra em gelesin , deh siwar û deh hesp û qaçax . ez û Misto emê bîn cem te û heval bera li gund bela bibin . herdû derbaskirin û berê yê din dan çend mala.

mal bi mêvanave rabûn , ode jiwanre valakirin , zarok anîn hêwanê , sobe dadan, şîv danîn ser agir , hespê wan bicîkirin , em dan wan . mêvana dest û çavê xwe şûştin . xwe germkirin , xwarin xwarin , Enwer got:

barê me tutina xursêye , roj çû ava me xwe li sînorda , leşkerê Turk dan dû me , me li hev teqand , em bi şer binxet bûn , têtê sînor me birandin , me serxet û binxet kir yek , Enwer kenî û simbêlê xweyî zer bijorde bada.

ka ew roja em bibne yek , ji van Ereb û Turkan rizgarbibana Mihemed got . te tiştê wilo dîtiye kuro , çilo miletek û erdek bi têtê bê perçekirin . dê û keç ji hev qutkirin.

83

bira ji bira dûrkin . hima va pismamê Hasso li vire û mala birê wî li ( sêbînêye ) , malbat kirin di nêvî , hin li jor hin li jêr.

\_kekê Enwer te ha ji mala bavê min tine li gundê Hatxê , Hessîna pirsî.

\_birastî riya min bi Hatxê neket , lê hayê min ji wan heye , tev rehetin.

\_çilo mero nikaribe here malbavana , Hessîna bi kerb got.

\_dibe îsal dîsa gorişme hebe , Enwer dilê wê xweşkir.

\_xwedê nehêle ji Kemal û hevalê wîre ev milet bîndest û belengaz kirin . Mihemed got:

\_Enwer kenî got : hîn bisrde jî bavê min navê Enwer li min kiriye . poşmanbû , lê çû.

\_Mihemed kenî destê xwe li piyê Misto xist got : Misto jî navê Mistefa Kemal li xwe kiriye.

\_Misto beşîşî , berî bersiva xwe bide , Enwer peyivî : na heyra , şensê Misto heye , dibêjin mirovekî kurd navnas derketiye binavê Mistefa Berzanî , Misto binavê xwe şadibe.

\_wa , me ev nav hîn nebihîstiye , hûn digerin , hûn dibihîzin , ev li kubû heta anha , Mihemed pirsî.

\_dibêjin li nav urosbû , li mosqo , piştî Ebdilkerîm Qasim rêjîma qeraliyê xist li

84

>raqê , dibêjin şand dû Berzanî \_ serokê Kurdê <raqê.

\_ev ji ku hûn van tiştan dizanin lo , Mihemed pirsî . ma hûn dirin nav kurdê <raqê,

\_erê bavo , berî demekê em li Zaxoyê bûn.

\_berê em jî diçûn Mûsilê , lê anha sînor asêkirin , xwe kirin dewlet , Mihemed got.

\_êh , dora me tev sînorin , em di zindanek mezindene . Enwer got

.

\_cem we çawaye , Mihemed pirsî . kes wek Berzanî li cem we jî tune,

\_li cem me millet bi piraniya xwe di xewdeye . piştî şoreşa şêx Seîd û Seyid riza, Turko dest daniye ser millet, Turkiya xurte ji ber di paqta Nato deye . wekî din zilm û zora axê kurda . lê dibinre , xortê zane peyda dibin , Enwer got û hilmek kwîr li çixarê xist.

\_bera xwedê nehêle , Mihemed got , bine kuro em li ku û Misir li ku, tu dizane ku mamostê vî gundî Misrîye . me dixwin , me diguvêşin wek çêlekê bidoşin.

\_kî dizane , dibe mamostê we , rehê wî kurdbê , dibe yek ji nevyên Selah dîn be , serekê dewleta kurd ya Eyûbî . Enwer bi ken got.

\_silav sifra hazire , Mihemed got . gotinê me xweş û giringin , lê şev dereng ket û

85

hîn westiyane , va xewa misto tê , rabin xewkin û sibe emê ji xwere dîsa deynkin.

sibê zû mêvan şiyarbûn , ji ware sobe pêxistin , hîn çixare dipêçan qehwa şêrîn hat berwan . nebgelekî taştê hat danîn : hêkê qelandî , helaw , hun gov , penêr li gel qorîk çayê û nanê tenûrê.

piştî taştê Mihemed got : Enewr beg ka tûtina te çawaye û bi çiyê , dibe em ji tere kirîndarna peydakin , jiber tûtin qaçaxe û hiştina wê ne duriste , ya ez şaşim,

\_na ezbenî , gotinê te di cê xwedene , çiqas zû em bidin û xwe karkin çêtire , karê me lezê dixwaze . wek ku dibêjin “ wext ji zêre “

Enwer hinekî ponijî , destê çepê diser enya xwere bir û anî û got : ji bo buhaya tûtînê tu dizane , lê ev tûtîn ji sinifê pake.

\_Mihemed hinekî ma û pirsî : kîlo bi heşt wereqa başe,

\_Enwer di serê xwede ew pere beramberî perê Turkî kir , got bi hevta jî dibe.

\_Mihemed kurê xwe şand , gotê her lawo ban kirîvê xwe Emnîko bik . çixara xwe hîn nekişandbûn Emînê Rihê silavkir û rûnişt.

kirîvê Emîno tûtînê baş li cem mêvanin min heye . keremke lê binere hîn wilo Mehmûdê Seyid ket derî.

86

\_va hevbeşê min jî hat mine min digot ezê bişînim dû , mêrê çê li ser navê xwe tê . tûtînê nerîn kişandin ketin bazarê.

\_ê ka hûnê bi çi bidin,

\_mine kirîvo hûn ji malêne , tu kirîvê mine û Mehmûd pismamê mine . berî hûn bîn min ji camêra pirsî , ji minre gotin tu dizane . tûtîn hêjaye heyşta.

\_çend kîlone,

\_dora pênsedî heye . Enwer bersiv da.

\_karekî mezin jêre divê , Mehemûd got û li hevbeşê xwe nerî . lê tiştêkî rehet tine . av bi tenha xwe nare zik . divê av bi dewlê Ji bîrê bê kişandin , bîne mal , têxe tasê , hilde ber dev , gulp bi gulp vexwe . Mehemûd got û bi destê rastê zendika çepê rastkir û gotin berdewamkir : wekî din dem zivistane , xelk giş bê tûtînê , çixarkêşek wê têra xwe bikire . ev gundê dora me besî mene wek : Nêf \_ Elîfero \_ Sêhremka \_ Melesibat \_ Girbêjing \_ Niqare \_ Kevrêsipî \_ Temoya \_ Qotkê \_ Girdêwan \_ Girzîn \_ Xirbiê şêx ê qerqatya \_ Xirbê kûtê \_ Qoşanê \_ Bîra bazin \_ Kêstek \_ şidî \_ Kevrêsipî yê Ferzen \_ Kotya \_ Topiz \_ Hacînasir \_ ji xwe Girsor me

negot . sê çar roja emê tevdî bifroşin , lê divê em xwe miqatebin ji gumrikê.

87

\_Enwer kenî gotê : ti distirê ti tewîne . tevde kenîn.

lê pere , heta em bifroşin , Emînkê Rihê got . teva li hev nerîn , Enwer tilya mezin ya destê çepê xist bin çena xwe û tilya din da ber devê xwe , serê xwe hejand got ne problême , tenê ji we dixwazim hûn hinekî bilezînin , em deh siwar qaçaxçî di nav çavê gund dene , ma te go çi birakê Misto,

\_ti dizane begê min , gotinê te biserê xwene.

\_bi xwedê ezê bêjim , ez bixwe nikarim . gişa li Emînko nerî , beşişî li çavê Enwer nerî gotê : beg te bala xwe dayê ku hevalê min û hevalê te bi çavekîne . tîq tîq bi civatê ket.

ti dev ji qeşmeriyê xwe naberde Mehmûd got û ji bo kenê wan bibire , got hema emê ji Girsor dest bi firotinê bikin.

\_êvarî werin tûtina xwe bibin , Enwer bihêdîka got.

roja din tîrêjê rojê xwe berda ser riwê zemînê ( erdê ) pêre jiyan nûjen dibû , bi hizkirin gundya ew tîrêj himêzkirin , piyayên gund li ber dîwara civat çêkirin , kal û pîra xwe dan ber rojê , hêviyên wan bi jiyanê xurtirdibûn , xwîn di damarên xortade bi xurtî gerî . rojê germî da gund tevî , dilopên avê hêdî hêdî ji serê bana dihatin xwarê , xanî di werivîn.

88

Enwer beg û hevalên xwe hesp derxistin derve . li bakurê Gund kêleka mala Simko kombûn . fir fir bi hespa diket , hustê xwe nêzîkî erdê dikirin û hildidan , nigeke hildidan yek datanîn wek dîlanê bikin , teryê Xwe çep û rast dihejandin . xwedyên wan bi rişmên wan

girtin , destê xwe diser wanre dibirin û tanîn , carna dest li singên hespa dixistin , wek jiware bibêjin bêhna xwe firekin.

bi deha gundî mêr û zarok li wan dinerîn.

\_bala xwe bid kelha Mardînê , Hesen axa got û li Enwer beg nerî.

\_ê , eger ne ev sînore gemarî ba , minê bi yek tûşê û bê rawestandin berê xwe bida Mardîna şêrîn , yekî ji hevala got.

\_sînor derdê herî mezin û girane bira , ev sînore drûstkirî ( destgird dest çêkirî ) Enwer bi keser lê vegerand.

\_heyra Mêrdîn dûre , lê bender vane , ka mine bê kî ji we siwarvane , gundîkî ji wan xwest.

\_ser sera bira , Enwer got û wî û hevalê xwe şerval xistin bin potîna , êlek rastkirin, şifqe asêkirin xwe avêtin ser hespa , li dor hev çûn û hatin , bûn rêzek . agedarbin , dengek hat : yek dû sê . teva ling li zikê hespa xistin û qoşkirin .ava ser bêndera li ber lingê hespa dihat pijiqandin . giyan

89

serê zada û wek berqê vejerîn , hespê Enwer ket pêşiya wan û bînera ( nerîn van ) bi çepk çûn pêşiyê.

piştire teva berî dan newala tije ava lehyê li bakurê rojavaê gund , bi firça hesp şûştin . wilo dîtin pîra Fincê û şêxa kermêtî, li ser rêxê dewara şerdikin . Fincê teneka rêxe di deste dibêje şêxa:

\_nebxêr ji tere , niza ti jmere ji ku derket , ez nema ji ber te debardikim . tu hîn deh saliye û te rêx li vî gundî nehiştîye.

tîq tîq bi zilama ket , yekî ji wan got : xwedê me bistrîne , em nebin sebebê (hoyê) tu şera gidî , wê xelk bêjin ji bo rêxê hespê qaçaxçiya gundî rabûn hev.

Enwer serê xwe hejand got : gelî bira , dikeve serê we ku li şam yan li Enqerê Li ser rêxa şerdikin . bê goman na , ji ber rêjîm ji wanre



jiyanek nazik peydadike . bala xwe bidinê , derdê gelê me li binxetê wek derdê meye li serxetê . yanî rêjîma şamê û rêjîma Enqerê yek polêtîkê tajon beramberî gelê me . tu cawazî nav mede tine . millet livir wek milletê me li jor belengaz û nezane , dire camyê bidû melêde bê deng limêjdike û bi şev dirin oda axê şevêrkê xwe liser pîrebok û reşkên şevê û cina dibihêrin . derdê me kûr û girane.

90

roja din piştî nîvro Enwer û Misto û Mehmûdê Seyid û Simko li oda biçûkbûn Misto û Mehmûd beramberî hev rûniştin. Misto digot Mehmûd : ma tijî wek Enwere , ma tu wek Enwer tê , û go çelip şeqamek li alyê çavê kor xist . tîq tîq bi wan ket , kenê Simko bi ser yê wan ket.

\_Mehmûd got Misto : ma tijî wek Enwere, ti wek Enwer mêre , şeqam avêt çavê Misto aliyê kor . wilo dengê ji hewşê hat . Simko li pencerê nerî , dît leşker derbasî hewşê bûn berê xwe da Enwer û got : isker hatin.

Enwer çengbû , perde hêdîka da alî, dît reste . lihevketin nema zanîbûn wê çibikin! Enwer tiving ji dîwarê bareş hilgirt , zîvirî xist bin cila . derî vebû , isker ketin odê , piyê wan girtin ew birin . Simko da dû wan. dîtin hevalê wan li hewşa oda axê tev girtine . ew xistin çêba û birin hebsa Qamişlo . wê şevê dîsa berf hat , gundî gelekî liber wan ketin . meha wan bûrî gundiya dîtin Enwer û hevalê xwe nêzîkyê li gund dîkin , wek tabûra leşker rêz , yek bi dû yekîde û Enwer bi bazdan serkêşiya wan dike . berfa şil dibin lingê wan de dibû av . bi berdana girtiya , kêfxweşiyê wê şevê girt bi ser gunde . Simko silav li Enwer û Misto kir , ew jî çûn ( riwê ) wî . Simko liwan nerî û gotina bav ya diho , dema pez

91

li ser bêndera diçêrandin hate bîrê . bavê Simko jêre got : ev belengazana bi xwe û hespê xweve li van sînora dan , zarok û jinên xwe bi cî hiştin , ji bo piçek qezenc bikin . hatin girtin , pere û keda wan jî çû û gelo wê çiqasî li hebsê bimînin . xwedê mala wan wêranbike , rojek xweş me nedît, tev zilm û zor , kuştin û girtin . van gotina cihê xwe xweş di mêjyê Simko de kolan.

roja din bi taştîyave , mêvana xatir xwestin û gund berdan . ewbû û nema careke din ne Enwer beg û ne qaçaxçiyên wek wî hatin gund, diyare kaxet bi wan mohrkirin , tirs diwan firandin , sînor asêkirin . lê Simko hîç ew jibîrnekirin , her çavnerîna wan dikir , ji ber mesela wan girêdaye bi sînorekî tirs û zehmtve , nexasim ev sînor bûye kelemek dinav wan û mala xalanê wîde.

rojên adara bedew , xwe berdan ser gund, zevî kirasekî şîn lixwe kir , minminîkê renga reng bi çalakî ji gulekê difirîn ya din , çûk û çivîk bi stran xwe berdan nava biharê . zivistana giran û dirêj malavayî kir ( koçkir ) jiyan vegeriya moristana gêrika , mar şiyarbûn ji xew. li ber dîwarê mala Simko aliyê rojava , zilamê gund kombûn bi xar û firing

92

dilîstin. ji wan wirde zaroka bi xar û bişkok dilîstin.

kalekî mezin , sala pişt lê tewandîbû ji wêde dihat . giya rastî wan rawestiya. nerî nerî û xwest bi riya xwede here , lê yekî ji lîskvana jê pirsî:

\_ha kalo , te ev çele jî bûrand , heta çelekî din xwedê mezine û biken jê pirsî , ma tu bixar û firing nalîze,

kalo serê xwe hejand û di zikê xwede bi yê xort kenî : erê birazî , rojekê ez wek te û anha bûm , xortekî xurt û bedew , sala ji dara min xwar , kurm ketin dara min . buhara min zerbû . buhar buhara

weye , lîskvana teva guh li gotinê kalo kirin bala xwe bidin xwe û wan zaroka . demek wê bê , wê ew di cihê wedebin û hûnê di şûna medebin . eve jiyar wek lîska zarokaye û kalo nig hêdî hêdî avêtin û pêşve çû . li gel ku gotinê kalo dijwar jî bûn , lê dîsa tev vejeriyan lîskê.

bavê Simko , bilez ji wirde dihat , ban Simko kir , gotê : wer lawo , ez û te emê van berxa derxin çolê , dem buhare , gunehin di wî xanîde genîbûn.

Simko jî wek bavo rahişt darekî û da pêşiya berxa û di sikakê Nava gundde berê xwe dan qubleyê gund . li binya gir kêleka xirbe dubistan tijî zarok û hewar hewara

93

qutabîkî dihat . mamoste bi zir darekî yekî ji wan felaqe dike.

\_yabo çima lêdixe,

\_ev bêbavê Misrî , mamoste Ehmed zarok kuştine . karê wî eve , kûçik bav . em li ku û Misir li ku . bi navê yekityê me dixun . piştê bav li kurê xwe nerî û bi hêvî , gotê : sala bê tijî here dubistanê.

\_ma wê mamosta li minjî xe,

\_na lawo , tu bi aqile li te naxe . ev mamosta dibe bicehime , yekî din were.

\_erê yabo ezê herim dubistanê.

\_tu dixwaze here ber melê , wa mele Cemîl , zaroka fêrî quranê dike , tijî va çend meha her , jibo sala bê tu here medresê tu xurtbe

.

berx birin çaboxa piştê gir bavê wî ew hişt , gotê te dengê mele kir berxa bîn û wer . kar û berxa serê xwe ji nav zêd dernexistin , car carna hinek ji wan diçûn newalê av vedixwarin . teyrek li ezmana

bilind difirî . Simko lê dinerî , çend kes li ser gir li bin nîşanê bûn ,  
Simko li hêlînê çûka digeriya , geh bi avê dilîst wilo dem derbaskir .  
roja din bavê Simko ew bir ber melê , derbaskir nav zaroka . mele  
cizû ema da Simko wek hevalên wî . piştî Simko rûnişt hêdî hêdî li  
dora xwe nerî , xanîkî kevnî nizim , pûş reş , beşt rizyayî , pencerak  
94

biçûk di dîwarê başûrde , kopalekî dirêj di destê melê de , hildida  
jor , dadixist jêr. Bedranê lawê melê awir ji Simko veda , wek jêre  
bêje berî demakê te ji konê xwe bera min dida , îro ti hatiye mala  
me û ber destê bavê min . dengê melê zarok guhdarkirin , dema  
jiwan xwest bidûde bixwînin . piştî got : sibe divê hûn vê ayetê  
Jiber bikin . xwedêyo ê jiber neke , hûn kopal dibînin . çavê zaroka  
tevda pevra ketin kopal . rabin herin malê xwe , mele got û dest  
avêt darê xwe , ji ber ku mele binigekî bû darê qalind xist bin çengê  
rastê û nigê çepê avêt.

dema zarok derketin li azmana kesk û sor û zer ( pelke zêrîne ) dîtin  
, Simko û hevalê xwe bazdan û bihevra vegehandin : kesk û sor li  
mala me mişk û mar li mala we.

siba roja din diya Simko qeymax jêre danî ser nanê tenûrê û çû  
çoçikek dew jêre xist tasê û gotê : lawo bixwe û her darsa xwe , lê  
bala xwe dayê ku kurê wê xwe pelû nake bo çûnê . destê rastê danî  
ser serê wî gotê : kurê mi piştî tu were ( bê ) emê herin bêriyê .  
Simko serê xwe hejand li dê nerî beşîşî di çavê wêde yê şîn hiskirin  
dît.

dema zarok derbasî hundirbûn , dîtin mele bi qerpka nanekî girtiye  
û tasa dew li bere . guh neda hebûna zaroka nehişî

95

xwarin berdewamkir , dew bi ser simbêl û riya melêde hat xwarê , zaroka dibin çavare lê dinerîn . mele tas da alî , bi zendika çepê dev paqijkir, qutî derxist çixarek pêça , pêxist û pirsî : we derz azber kir , zaroka bigiştî bersiv nedan . Simko û Birahîmê metka xwe li hev nerîn tîq tîq bi wan ket , mele kopal avêt wan . Simko sê çar roja hat ber melê bêgo tişteki biser hevde bîne . ne hij hundirê melê kir û ne hij kopalê wî kir , dema bavê wî naskir ku kurê wî tişteki bi ser hevde nayne gotê : baştîre ti here ber berxikê xwe.

nîro şikestibû , limêjker hîn ji hev bela nebibûn , dem payîze xelkê çavnerîna barana dikir , çend keçika yek ji wan xuha Simko Bedîa bi hiqê dilîstin . Simko zîzok tajot , zîzoka wî têlek û devê qotîkê bû . ji alyê riya gundê Kotiya muxtarê gund Ezêro nêzîkî li gund dikir.

Ezêro çi pihlewane mine wa peya ji Amûdê tê , serê wî di berde , ji vir heta Amûdê çar seet rê dikşîne , Ibrahîmkê Hemo got.

\_ma ku ne pehlewana jinka bimêr ( Fedîla ) direvand binxet dikir Cemo got.

\_û law jî pêre , bikin Helîmê Evdîko vegerand . wilo Izêro giha . silav da , xwest derbasbe , lê civatê ew sekinand . ti ka were çixarakê bikişîn û piştî her Fedîla na

96

xeyide , Sebriyê Seyid Aqûb gotê û bi dengekî bilind kenî . bêje çi li Amûdê heye çi tune!

Izêro rahişt qutya tûtnê , bi dengekî şikestî got : li Amûdê tiştê nexweş hene . diho êvarî agir bi Sînemê ket bi diha zarok û xort mirin . millet tev bi kul û xeme . bajar reş li xwekiriye . Mihemedê axê bi diha zarok rizgar kirin , xwe kir qurban bo rizgariya wan . raste şevê din agirê wê hilordikir di giya ezmana.

bêdengiyê girt ser civatê , hêsir (rondik) ketin çavê wan . yekî ji wan kelê ew hilanî nema karîbû hêsrên veşêre . zaroka bi hissa xweyî bilind naskirin go nexêriyek heye , lîsk berdan û çavê wan ma li koma zilama . lê civat yeka yeka bela wela bûn.

siba r;ja din gundiya mêr û jin berê xwe dan Amûdê . axe bi cêba xwe , gundî hinek bi ereba , hinek bi biskilêta û hinek peya dan ser rê.

çend roj navêde bûrîn , şevê Hilalê Botî li gel xortekî hatin gund . şandin pey dost û hevalên xwe . derî û pencere qepetkin û tembî li kevaniya malê kirin ku kesî derbasneke û miqatebe . Hilal hinekî li ser rewşa politîkî peyivî û gotin da hevalê nenas.

97

gundiya li devê mêvan nerîn û guh miç kirin . mêvan pênuş ji ber xwe derxist û çend gotin bi dû hevde li ser rûpelekî danî . serê xwe hilda li civatê nerî piçkî beşî û got:

gelî biraya emê hinekî liser rewşa millet rawestin . hûn dizanin îro roj me sînga xwe xistiye singa axa , birastî em bêjin hîn ji me xurtirin . ji alîkîve axe li pişt hevîn , şêx û melê me bi piraniya xwe destekin ji wanre , hevalê yek kozikêne . ji alîkîdive , rêjîm wan di parêze û alîkare ji wanre . wekî din millet nezan û tirsoke , zîlam û peyê Axe hîn zorin . ji bo van hemî tiştên divê em bi zanebûn û bi şiyarî bixebitin dest bidin hev , hevala çêbikin û millet şiyarbikin bi zanebûn . lê divê em bawerbin ku rojên li pêş wê jimerebin , fîodalî wê hilweşe wek sîstêmek li nav gelê kurd û dan û standinê (sîstêma) “bavitî” wê bê rakirin.

wekî din rêjîmên serdest polîtîkeke rasîst (şofînî) dijî gelê me tajon . nexasim piştî vegera Mustafa Berzanî ji Moskoyê û xurtbûna rola

kurd di iraqêde . şofîniyên kevneperistin ereb dixebitin bo têkdana wan gavên hêja yê ku cenîral qasim pêkanîye.

98

rêjîma bayar \_ menderis \_ li turkyê bi dehan xortên zane û neştiman perwer xistine zindana . û livir mekteba didwa ya hukmet mîna bi deha heval girtin û avêtin zindanê . bi zanebûn go şewtandina sînema Amûdê karekî şofînîbê , bi deha zarokên qutabxana birin sînemê û şewitandin , gunehê wan tenê ewbû , ji ber ku kurd hatin dinê û bajarê kurdaye . rêjîmên serdest tev îro ji me ditirsin . hinekî rawestiya , çixarek pêxist got : dibe pirsê we hebin.!

\_te got piştî vegera Berzanî şofînîyet xurtirbû , çima , yekî pirsî  
\_mine bira , miletê me li vir û li serxetê û li iraqê û li îranê , yan li her derê yek milete , welatê me hate perçekirin piştî şerê cîhanê yekê . xurtbûna kurdê Iraqê , xurtbûne ji her kurdîre . wekî din dema rêjîma komarî di destûra xwe de benda sisyan dibêje : ev welat yê ereb û kurdaye , bayê rizgaryê sînorê drûstker derbasdike û hemû perçên kurdistanê hênik dike . dijmin dibizdê ji navê kurdistan.

\_başê Berzanî çilo çû Mosko û îro li kwîde dimîne,  
\_piştî şerê didwa du komarên dîmokratîk hatin sazkin bi alîkariya sovyetistanê , lê mixabin piştî derçûna leşkerên sor hêzên

99

şahînşah bi alîkariya inglo \_ emerîkana ew komar perçiqandin , paş salekê ji çêbûna wan , serokê Komara mehabad qadî Mihemed û hevalên wî hatin bi darvekirin. Berzanî wê demê serok leşkerbû revî hat Kurdistana <raqê û dema lê teng hat , li gel pênsed şervanê xwe berê xwe da Sovyetê û bi şer li gel hêzên leşkerî yên <raqê , <ranê û Turkyê , çemê Arasê qutkir û ketin erda Ezerbêcana Sovyetî . deh sala ma li Sovyetê. dema Qasim hat şand dû . Berzanî û hevalê xwe

hatin Tişîkoslovakya ji wir hatin Misrê cem Nasir û vegerîn . partî berzanî

hilbijart wek serok , îro roj meqerê polît\_bîro li bexdêye.

\_te got dema çûn sovyetê pênsed kes bûn , çend kes vegeyriyan,  
\_ew pênsed li xwe sê qatbûn.

\_çima ev welat ji me ditirsîn , yekî din pirsî.

\_ne me got , dema gelê me tişteki bidest bigre li îraqê , rêjîm ditirsîn ku kurd welateki çêbikin , piştî em jibîrnekin ku kurd li sûryê roleke mezin lîstin û dilîzin , Ibrahîm Henano ji meye , Yûsêf Ezme şehîdê yekem li meyselûn dijî firensiya ji meye . çêçeklî û berazî kurdin . serok leşkerê berê Ebilbaqî Nîzam eldîn kurde

100

Mihemed Alî Abid yekemîn serok komar kurde . weki din pêlê dîmokratîyê Sûrî himêz kir , nemûne Xalid Begdaş sikirtêrê partiya komonist endamê komîntêrn , yekemîn car li roj hilata navîn dikeve parlaminto û em jibîrnakin ku ewjî kurde.

\_heval ji kerema xwe hineki ji mere li ser girtina hevala bipeyiv , Selîmê Hacî Hesso ji berpirsiyar xwest.

\_hevalê birêvebir pirrê wan hatine girtin , weki din , tu informasyon li ser wan hîn neketine destê me . hêvîdarin nêzîk dengûbas li ser rewşa wan bi dest me kevin. gerek hûn li xwe miqatebin . pirs li ser van mesela hûn dikarin dûvre ji hevalê Hilal bi pirsîn.

paş demekê , Hilal şevêkê dost dîtin ji wanre got : heval hatin berdan , lê hineki pevketin dinav wande çêbûye.

\_çima , bo çi , xortekî bilez pirsî.

\_hevalê me ne yê pêşîne ku pevdikevin , karê polotîk wisaye.

\_raste , lê pirs ewe çima rabûn hev piştî ku hatin girtin,



\_ha ha te li dilê wê da . mine bira , partiya me durîşmin mezin hildaye , doza rizgarî û yekîtiya kurdistan dike . xuyaye ev durîşmin han zêdî hêza waye . ev tiştaya hevala di zindanê de naskirin . hineka ji

101

wan va durîşma rast dibînin û hineka ji wan çewt dibînin . bo vê yekê Dektor Nûredîn Zaza çû evropa.

\_evropa , millet rahiştin tirimpêla wî di hilbijartinin parlamênto , wilo bi rehetî xebat berda , piştî xwe da welat!

\_diyare , ew û heval nema dikarin pevra bixebitin , dibe hebûna wî li evropa qezencek be bo tevgerê.

lê ya xweş ewe , ku meleyek girtin , ji ber karta kurdistan çêkiribû . dibin dar û pirsîyarê de , mele bersiva xwe wisa da : biwe xweşe ku we welatê me bindest kiriye, lê bi we girane ku min çend xêzk li ser rûpelekî danîne . ev dide zanîn ku rastî ya herî xurte û hûn jê ditirsin .

\_başê heval , berî çend roja we da zanîn ku şêx û mele hevalbendê axa ne ev çawa tê , yekî pirsî.

\_pirsa te ciwane , bigiştî ol ( ayin ) di çarçê berjewendiyên kevneperstande dixebite çi derebeg û fiyodal çi dest rêjîm . lê em ji bîrnakin rola şêx û mela di tevgera netewî ya kurd , ji ber şêx û mele wek zanyar û zanîn kurd pîrr caran bûne rêberê gel , nexasim zango û instîtût ( peymange ) nehatine vekirin li welatê me . gelek navê mezin ji nav wan derketin , nemûne hozanvanê nemir Melê Cizîrî , şêx

102

Saîd Pîran serokê Serhildana 25 n li kurdistana bakur hate bidarvekirin û her weha . ol wek îdîal kevneperiste , lê zor neştîman

perwer derçûn dinav rêzên şêx û melande ango mizgevt pêşemîn qutabxane ku şoreş gêrên kurd jê derketin.

meha gulanê ciwan cilê renga reng li xwe kir , çol xemilî ji gul û kulîlkan , xuşxuş bi zada diket , şivên genim û ceh çep û rast dihejiyan di bin bayê nermde . zerbûnê roj bi roj avête tayê nîska , keriyên pez li şûv devê newala diçêriyan . dengê stran û bilûrên şivana xweş dihat bihîstin , rêsîvana li devê newala rêsî diristin ji lavlavk nefel û giyayê Hemû reng .tevda çav nerîna hatina paleyê ( çinînî ) dikirin . paş çend roja gundya jin û mêr dest bi çinîna nîska kirin çî bi desta çî bi das û qalûçka , dixwestin zû xwe ji nîska xelaskin berî ceh û genim hişkbibin . Simko wek hemî zarokên gund bi desta ta bi ta nîsk di çinîn , carna qeflê biçûk bi dû palevaniyade tavêtin ser qeflên mezin.

şevêkê bavê Simko bi kêf ji odê vegeriya , got : mizgînya min li we , îsal hûn rehetbûn ji çinîna ceh û genim.

\_çima , qey te palevanî girtin , jinê pirsî.

\_palevaniyê çî ! îsal kes nare paleyê , dibêjin îsal derase wê bê gund.

103

\_derase îca çiyê rebenê,

\_derase mekîna zadaye , dibêjin hertiştî bixwe dike . kengî hat emê bibînin.

paşî heftîkê , rojekê ji rojên hezîranê xwedyê derasê çadir li ser bênderê gund vegirtin . siba din derase ( patoz ) hat gund . ji rojavayî gund dest bi çinîna zada kirin . kes di hundirade neman , tevde bûn temaşevanê derasê . serî li şifêr mezinbû , xwe dît jeneralek yan pîlotvan , berê derasê da gundiya , nêzîkayî li wan kir , zîvirî ket serê zad , rawestiya , tablî gerand dest bi çinînê kir , çargav da ber xwe ,

pûş di dawiya xwere berda , dema zîvirî rastî gundiya , dirûtvan ben  
kişand çar çewal dirûtî di mezzîbê de hatin erdê . gundî behitî man  
. ji wirde pîra Nesîba ango diya şifêr xwe çitikî li erdê dixst û digot :  
deraseye qeraseya bavê Xelîl şifêrê teye.

\_ev çiyê bavo ! tiştê wilo we dîtîye . naveserekî pirsî,  
\_kuro dawiya dinyê ye , şeytan ketine dinyê , ev yek ji elametê  
qiyametêye , mele dibexwede got.

\_her daska xwe bavêj , sêwyê bi gû , bi tîqtîq Sebrî got Xeto.  
\_meznaya xwedê xebera teye . mine kuro , mîratê diçine û  
paqijdike û dixê çewala.

104

\_rehetîk mezin dide xelkê , hete liblib me dida hev û gêre dikir û  
didêran û serad dikirin , çiqasî bi rehetî tê çinîn , yekî got.

\_traktor jî derketine , ewjî erda radikin , emê ji van gîsna jî xelasbin

\_de bes lo , ti rast dibêje ! Mehemûdê Gulê pirsî,  
\_welle kuro , ew jî pîrbûne , nema tenê erdê zengîna û axa radike ,  
lê bi pera kî bixwaze kare erdê xwe rake.

gundî man behitî ji dîtina derasê , ango derasê gaveke nû di jiyana  
wande peydakir. êvarî diya Simko şûşê lempê paqij kir , lempe tije  
gaz kir û pêxist . agirê çirê li axurê dewara li ber bayê kulekê dilîst ,  
fanos pêxistin birin derve danîn ser tenekê kêleka kulêv . şîva wan  
tolik , sitrîzerk û meyir bû . xwarna xwe xwarin ne xwarin qîj qîj bi  
dika odê ket , tinabê du gundî rabûn hev . yek dibêje yê din : ezê  
pera ji çavê te derxim ya ya netîştekan , qey ez qeşmerê teme . zilam  
ketin nav wan gotin : çi mesela weye , ka bêjin. ,

Kerîmê qut got : ez û hemo rîkevtibûn , ku ez zadê wî biçinim , nehişt  
em ji xwere karekî bibînin , em man li bende çêbûna zada , îrû

camêr derase bera nav genimê Xwe da û çinî , hûn tev dizanin ez bê erdim , ka ezê çawa zarokê xwe bi salê xim.

105

Hemo got : mine bira , netenê Ez û te rêkevtin , bi deha wek min û te nemûne hene . ne sûtê mine , ma dikeve aqlê we yek tirimpêlê berde û bi kerê here Qamişlokê . yabo li ser destê civatê yê wek min û te çi ra dîtin em jî wek wan , va deng dire civatê tevî.

Rî sipîkî berê xwe da Kerîmo gotê : Hemo baş dibêje , li gel tê ,sûtê wî tune ye , jiber kesekî ji me nizanîbû derase heye . eger te bixwe zanîba tê pêre ev bazar bikiriba , derase ne tenê îşê te têkda ( li hev xist ) , lê belê plan û nerînê me tevda guhertin . zarokê te bi vî karî tenê bi salê nakevin , wê xwedê biqedîne . gundî kêmanya nakin, alîkariyê û zikê didin , îca neheqiyê nex aliyê xwe.

dema civat li ser dikê geriya , luksê Ronahî da hawirdor . gotinê wê şevê tenê li ser çinîna zada û derasê hat kirin , zadê kê hatiye çinîn yê kê maye . çewal çend tavêje. çawa derasê kar li wan sivikkir . Hilalê Botiya got : hûn dizanin ku gotina Kerîmo rastîk têde heye!

\_çawa , kurê Hemo bilez pirsî.

\_ezê ji tere bêjin çawa . mine , raste derasê rehetî xist nav me , lê wekî din kar da demekê Ji ber gelek belengaz û palevaniya girt , lê li gel vêjî em nikarin bibêjin ku derketina derasa tiştêkî xerabe , hem

106

derasê bingeha jiyana me guhert û hem pêşeroj bi pirbûna wan wê gelek kes qezencê jê bibînin yê bibin şûfêr yê bibin dirûtvanî yê bibin şêfê xwarinê , yê bibin torneçî . ango şêxmûsê Kerîmo bi tenha xwe dikare sê qat pera derxe , bê ku bav û diya xwe bişewitînin li ber germiya tavê .wê gotinê rehetîk xist dilê Kerîmo.

\_meznaya xwedê tu bêjiye , bê kî bîra wilo dibe kuro ! Emînkê Rihê got.

\_erê yabo , hatina xwedyê piskilêta li cem , ne bi derewaye , Turkiyê Hacî Mehmûd di berxwede got û di bin simbêlare kenî. pif pif bi axê ket , ev dîskusyon ( miştemur ) ne bidilê wî bûn , ban navmalî kir gotê qehwê bigerîne.

çewt elî bi şîşê Tifik li hevda , cizûka qehwê berê çêkirî bi serde girt , gerand ji axê dest pêkir.

axe bi xeyd axift : ev çi felsefa valaye , kengî gotinê bi vî rengî di oda mede hatine kirin . dûre kê rê daye we di civatê de bi peyivin . careka din tiştê wilo ez nebhîzim . nehêlin ku ez li hevkevim , mine ew kesê bi agir dilîzin , bera baş bizanibin ku berdana wan ji gund li ser min tiştêkî nake . ez di bihîzim ku çend sêwlek \_ mêwlek , qeşmer \_ meşmer , bi piskilêta tên gund heger min hesabê wan kiriba , bi yek fermanê min

107

nedihişt derbasî nava gund bibin .bi tirba Birê Xelo ku mêjiyê min li hev keve ez yekî ji we li ser niga nahêlim , mine ka kîja kûçik qebûl nake . xuyaye dawiya dinyêye.

zilam û peyin axê perîkê xwe fişandin (nepixandin ) deng birin axê ku jêre amadene , tenê fermanbike . civat ma bê deng lê kalekî navsalî û bîrbir , xwest dilê axê xweşbike , berê xwe da xorta got : ev ode ne cihê van gotinaye . axe rabû serxwe berî da mal.

paş hingî Hilal civat berda , berî sola xwe li xweke , kalê zemana bi kuxandin rabû serxwe got : birazî min bigîn malê . bi rêde kalo got : mine birazî tu xortekî zaneye , lê li xwe miqatebe , bi nehênî bixebit . kêfa me ji tere tê , ji ber ku ti xortekî neştiman perwere . gerek hûn xortê vê demê qezencê ji şaşyê me bikin . yek ji hoyê şikestina

şoreşa şêx Saîdê pîran , di bawerya min de ne rêk û pêkî û lezandin bû, di encamde rêjîma kemalî binavê “ dadgeha serxwebûnê “ bi deha şoreşvan û serhildanin kurd bi darvekirin divê bi rêk û pêkî bixebtin , divê hûn bizanibin ku hinek ji begler û axên me jehra wan pirtire ji jehra maran . kalo berê xwe da mala xwe û di berxwede got : bav û kalê me xwarin , îro roj dixwazin zarwê wan zarwê me

108  
bixwin . Hilal di dilê xwede ji xwere got : mero dibê qey xelk netiştin , lê xuyaye bi dû her navekîre çîrokek mezin heye.

roja din kamyon li devê deryê mala Simko rawestiya , himala çewalê genim kişandin hundirê odê , xweydan wek avê ji wan dipçpiçî . germa havîna xurt , navdilkê Mirîşka ji germa rojê lê dixist . pez li ber siya dîwara mexel hatibû . bavê Simko , çewalê dawî da karkera got li hev parkin . Simko misînê avê anî , himala çavê xwe şuştin , derbasbûn çayê vexwarin.

yekî ji hemala qedeha çayê bir ber dev li Simko nerî got : navê te çiyê,

\_navê min Simko ye.

\_navekî ciwane . Simko axê şikakî , dest avêt simbêla xayizma . dîsa li Simko nerî beşiştî gotê : divê ti bixwîne , yan têjî wek me bibe himal . ma em jî dijîn ! . xwedê em dan dinyê û dinya neda me . hîn çaya xwe venexwaribûn , ew xwestin gotin werin li bende wene.

Simko tentena ser kuleka hêwanê hîdîka hilda , rahişt deska ku birê wî jêre ji şar kirîbû da ber sînga xwe , berî da odeka ku berî çend deqa hate dagirtin ji çewalê genim . çû li jora çewala rûnişt , dest danî ser beşteki , dest bir û anî , qeselek pûş ji ber zikê bešta kişand , lê nerî dît çawa

109

demê jê xwariye , bi herdû desta di ber girêka nêvîde şikenand .  
piştire ponijî wek ku tiştêkî xwe winda bike , çarîkekê di cihê xwede  
ma sar , ma dil kul , anî bîra xwe çawa leşker Enwer û Misto dan ber  
xwe û ew ji odê derxistin , serê xwe hilda nerîna wî ket konê pîrê  
pîrêde , dest avêt deska xwe û li ser çend xêzk çêkir , di hundirê xwe  
de kêfxweş bû wê îsal here dibistanê , nexasim sibê wê herin bajêr  
ji bo foto jêre bikşînin . di wirde dê derî lê vekir got : tu çi dike lawo

,  
kurê min hiş xwendinê dike wê bibe mamoste . wer lawo her mala  
xuha xwe şûjinê bîn belkî wî xişî bidrûm.

siba roja din <sa birê xwe li ber xwe kir , lûlê piskilêt sar û hişk ,  
Simko bi herdû desta gîdon zeftkir . li newala niqare roj li wan bilind  
bû.

xwîna laşê wan baştir gerî . piştî av vexwarin ji bîra Enbara ketin ser  
riya ziftê . her hinekî bayê tirimpêla li wan dixist . çiyayê toros zelal  
dihat dîtin . ketin bajêr . li gel ku Simko , berê çend derba hatibû  
bajêr , lê dîsa bajar tiştêkî nû didayê , lê wî nizanîbû ew tişt çiyê ! .  
çûn û hatin , qîj qîj, tevger , lez , nenasî , her tişt li vir ne wek gunde  
: bêdengî , şînkayî , hevnasî rebenî . li devê deryê fotografîst  
(rismkêş(

110

Mihemed piskilêt danîn . risimkêş dibin simbêlare kenî dest diser  
serê Simko re bir û peyivî lê Simko tê negihîşt çimkî zimanê wî  
nizanîbû . Simko danî ser sendelîkê , kîsekî reş kişand serê xwe û  
rismê Wî girt . dema risim derket çavê Simko hingî şînbûn baş  
nedihatîn dîtin . rismkêş kenî dîsa tiştêk got.

wê salê mamostayê Misrî nema hatin , mamostakî hemwî hat gund  
. bavê Simko ew bir qutabxanê . mamoste ew xist nav rêza zaroka

derbasî hundir kirin . zarok tevde di yek odêde dixwendin, ji sinifê yekê ta pêncan , zarokê mezin mamostayî li yê piçûk dikirin . du textereş hebûn Simko cê xwe li ser masakê Girt . mamoste hat cem qutabxanên sinifê yekê . dest bi gotinê kir , lê kes tê negihişt . Simko di dilê xwede got ev çi zimane , çima ez tê nagihim , mamoste li Simko nerî û pirsî , Simko tê negihişt serê xwe berda ber xwe şerm kir . dîsa mamoste , bixeyêd pirsî , Simko li hevkek , tê nagê , xwest bigrî , lê qutabyekî mezin jêre bi kurdî gotê : mamoste dibê navê te çiyê,

\_Simko.

\_mamoste serê xwe hejand , serê darê xwe li masê da û çû ber textereş.

111

ew roj çû , roja yekê ji destpêkirna programeke dûr û dirêj . Simko vegeerî malê lê kêfa wî lê şikest , çente danî bi pojandin.

\_çi heye lawo , qey hineka li te xistiye , dê pirsî.

\_Simko serê xwe bi jorde hilda.

\_naxwe çi heye kurêmi , te çiqasî dixwest here dibistanê , tu çima xeyîdiye , ka ji diya xwere bêje , ez qurban.

\_ev çi zimane , Simko pirsî.

\_zimanê çi lawo,

\_mamoste ne wek me di peyive . em tê nagin , hevalê min jî têngin. çima , Simko pirsî.

\_xem nake lawo , xwendin bi zimanê wane , wa birayê te , fêrbû û çû şar bixwîne , têjî fêrbibe . bêhna xwe firebike.

\_ê erê çima , xwendinê bi zimanê me nabêjin , ji me dipirse û em nizanin çi dibêje.



\_nebxêr , li serxetê bi turkî derz didan û li vir bi erebê didin . em çi karin bikin lawo , çi di destê mede heye tijî wek hevalê xwe , mane hemû wek tene.

\_gotinê dê dilê Simko xweşkir , got erê yadê : zarokê Girsor û Nêf û Kotiya hemû wek minin , ew jî bi zimanê mamoste nizanin . Simko got û çû kabê xwe derxistin û lîst.

112

roja didwa Simko ji dibistanê vegeerî diya xwe agihdarkir gotê sibe xwarina mamoste li ser meye.

\_çi zû lawo , hîn diroje te neqediyanê . bizerakê em ji dora birê te rizgarbûn , îca dîsakê her roj wer xwarina wî çêk!

\_ê ma sûcê mine , wî , Simko vegeerand.

\_başê lawo başê.

roja din Bedîa xuha Simko , alî taştîya mamoste nêzîkî dibistanê kir . tepsîkek mast , ser tije qeymax , hinek nîvişk , du hêkên kelandî , qorîk çayê , du nanê tenûrê . birêde pêrgî gundîkî bûn , lixwarinê nerî bi dilekî şewitî got : em têr dew venaxûn ev segbavana qeymax û nîvişk dixwin û hîn neqayilin.

firavîn jêre mirîşk danîn ser girarê . her weha şîva wî jî îvarî birin.

êvarî diya Simko , got : îrojê em ji dora xwarinê xelasbûn heta careke din xwedê mezine.

du sê roj bûrîn ne bûrîn Simko , got : mamoste pênc wereqa dixwaze . bavê wî tûre bû got : ev segbavana nizanim doza çi lime dikin , xewa wî belaşe , xwarina wî dire ber , îca ev çi perene. !!, bavê Simko , siba roja din berê xwe da qutabxanê û bi zaravekî qels gazin jê kir , gotê em xwarina te tînin ma ev çi perene,

113

\_ev bêşe her zarok divê bide yan nayê dibistanê.

êvarî bavê Simko , ev pirs di civatê de danî berçavan . pîraniya civatê piştevaniya wî kirin , tenê çend kesên fenbaz û oportûnîst ( xwe guhêz ) dijî wî rawestiyan gotinê pênc wereqe çine heta em nedin, bavê Simko got : wan , berî her tiştî zarokê we narin dibistanê , ya didwa pênc wereqe tiştekin , em sî çewal ka dibin şar difroşin ji bo pênc wereqa . Mihemedê Izêro got : a rast ewe , ku zarwê xwe nema bişînin xwendinê mesele netenê Perene , heta xwarina mamosta derdekî mezine , em nikarin zarokê xwe xwedî bikin heta em bêbava binan bikin û dûre wê zarwê me bibin çî , ma bav û kalê me xwendevanbûn, bera ji mere karbikin sed carî çaktire ji vê xwendina bi minet . pîrr kesa bi vî rengî zarwê xwe bê xwendin hiştin li gel ku dizanîbûn xwendin hêjaye.

zivistana sar bûrî , buhara rengîn cihê wê girt . bêrvaniya li çolê bêrdikirin . şîrê pez pîrr û zengîn , ji ber çol dihat xemilandin ji her rengên gul û şînayî ; lavlavk û qîvar gonkavirk û tolik , botav û stirîzerk û rîhan û bi deha rengên giya û kulîlk.

114

rojê teraktorê bizincîr hatin gund , bû dema ajotina şûva . raste wê çih li gundiya teng bibe ,lê dem dema rakirina şûvaye wek kalekî got , deh roj zû yan dereng . her sal vî wextî , havbeşê axê tîn erd tajon . gundî fêrî wan bibûn û zaroka navê (Ebbê) baş nasdikiribûn diçûn bin çadira wî , semûn dida wan . Simko û Ibrahîmê metka xwe Gulê çûn nêzîkî çadirê , Ebbê Semûn da wan , gelekî guh li traktorê nekirin ji ber traktora zincîrî li hewşa oda Hisko avêtîbû zarok lê siwardibûn û ew baş dîtibûn.

li vegeerê , kûçik hatin wan , bi bazdan berê xwe dan gund , biserdeji Avdkê Kijo mijo xwe li wan dêhinkir , dê gotê ma tu çima çû ber konê xalê emo şikro,

\_îca xalê emo şikro , mane emo yanî “ ap “ ma çêdibe xalê emo...  
\_dê kenî , ez ji kûza lawo , xelk dibên “ emo “ şikro , wan digot qey  
emo jî navê wîye va tu fêrî erebî bûye kurê min.

mala Simko kon li ser benderê bakurî malê vekirtin , li gel go zarok  
kêf xweşbûn bi kon , lê mezin tede westiyan . kon danîn, ji ber bavê  
Simko , rêkevt li gel Mihemedê >zêro xanîkî nû avabike . karkera  
dest bi hilweşandina xaniyê kevn kirin . ax û pûş hildan ji dora xanî  
, beştê berê tev dan alî,

115

kelpîç ji ser kelpîç rakirin . raste wê xanîkî taze bê avakirin , raste  
xaniyê berê kevin bûye , lê bîranîn û bûyerin tede hatine kirin  
xemgînî dixistin dilê bav û diya Simko yê go pir sal tede bûrandin ,  
tede xatir ji miryê xwe xwestin , tede zarokê wan çêbûn . bavê  
Simko , li diya wî nerî got:

\_tu dizane çend bi min girane xerakirina xanî . bavê min tede mir ,  
du keçê me tede mirin : zekokê û rebîa got û kela girî ket qirka wî .  
jinê hêsrê xwe paqijkirin , bêhna xwe berda gotê:

tê bîra te daweta me , roja te ez binxet kirim , dema em ghiştin  
devê deryê mal , bavê te rehma xwedê lê be hat pêşiya me serê min  
maçkir got : tu hat lawo û teq teqê tiving û demaça diser serê mere  
. xweska biwê rojê , ew roj nayê ji bîrkirin , bi wê nîşanê , bavê te ev  
demaça te pêşkêşî te kir.

\_erê dinya ! ev dor bîst sala diser wê rojêre dibûrin . her tişt tîn  
guhertin . bi alî nûbûnê ve diçin , xanî wê bê nûkîrin . lê emr bi paşde  
venagere mirov wek darê her û her kevnar dibe , dema zarok nuha  
bîrdibin dil wande go jiyan taze dest pê tê kirin û bê dawîye . lê  
dema dibe piyaw û jiyanê nasdike baş têdigihê go dinya ji kesire  
nemaye û namîne , xwedê tenê

116

dizane bê çiqas mirov û êl berî me li van şûna bi cîbûne.

\_qey bi kude dirin yabo , Simko pirsî.

\_çiqas tu guh miçê lo ! dê gotê her ji xwere bilîz lawo

\_na , bi kude dirin , bersiv xwest.

\_bardikin kurê min , bav bersiva wî da.

em ketin gotina , dinya nîroye dema avdana pez û dewaraye , firavîna we hîn çênebûye .jinê gotê .zaroka herdû qantir û mehîn birin ser bîrê avdan , piştî avdana pez diya Simko , ji bîra jor , bîra av şêrîn û sar ava vexwarinê li ser mila anî , firavîna karkera danî ber wan . piştî firavînê Mihemedê Izêro got : ezê ji tere xanîkî avabikim , ku hîna xanyê wilo kesî nedîtiye. ji îro pêve mala te wê bibe ode , axe roj bi roj qels dibe . lê ez ditirsim kelpîç li me kêmbikevin , bera xort kelpîçin din bibirin.

bavê Simko , beşî dest avêt simbêlê xwe û got : baweriya min bi te xurte û tu baş dizane çiqas tu li ber dilê min şêrîne , ji bo wilo te ji ber axê barkir , ez û pismamê xwe Sebrî û bi ereba xweve me tu vegerand gund , xurtbûna me bi heve.

\_Mihemedê Izêro kenê liblibî û bilind berda , got : tu têra xwe heye û qedeha çayê hilda ber devê xwe.

117

xanî roj bi roj hat bilindkirin , erebê kelpîç dikişandin . bavê Simko , çend kavir û berx firotin û çû şar beşt û mircaq , derî û pencere kirî . xanî berhev de hat . hoste beşt siwarkirin xorta pûş kişandin serê bîn, têr pûş kirin , baş pêlêkirinê , roja din xortê gund hatin alîkariyê ax bi satla kişandin jor û piştî çend roja , binê xanî seyandin . karekî mezin jêre diva , sê odê mezin û salon.

axe di nava xwede piç piçî û hinek gundiye dilreş di bin çavare li xanî dinerîn . lawê Etto got Recebê : mine bê lawê Izêro ji Mihemedê Seyid re çî qesir avakir û neqş meqîş pêvekirin derîkî xanî li bakur dinere û yek li başûr dinere.

\_mêrik serê xwe xistiye serê axê heqê wî heye Recebê got : di wê demê de Simko , li ser tenekê rawestya û bi darekî li oda başûr kêleka derî li ser dîwarê herîkirî nivîsî sal 1961 \_ 1962.

gundî bûn du bend . benda axê roj bi roj qels dibûn . kes pêre nema ji cûdayî çend rênçber û tirsok . heçê oportonîst dibinre digyan herdû benda , bawerî bi wan nedihat.

mala Mihemedê Seyid , ket şûna oda axê . havîna civat li ser dika hewşa bakur digeriya û zivistana du hundirde . carna

118

civat li malê hevalbenda jî digeriyan . bêminetî ket nav herdû benda.

şevêkî ji wan şevê havînê dû endamên partî hatin gund , bi dost û hevalan re rûniştin li ser rewşa kurdîstana başûr rawestiyên . dan xuyakirin ku peywendî nav bera Berzanî û Qasim têk diçe û gunehkarî dikeve hustê regezperest û kevneperestên Erebb , burcewaziya Erebbî bi mêjyê Qasim dilîze û goşarê lê dîkin jêre dibêjin wê sor û kurd vî welatî bigirin . natsionalîstên Erebb roleke qerêj dilîzin di wî warî de bi alîkariya hinek rêjîmin Erebbî, diyare ew destkevtinê ku Qasim kirin wê bînen perçiqandin û hildan.

piştî hinekî li ser rewşa cotkariya û gundiya rawestiyên ji wan pirsîn ka çî heye,

\_Cemo got : rewş başe em xurt dibin.

\_bavê . Simko got : berî çend sala , şevêkê Cegerxwîn bû mêvan li oda Hisko , civat geriya rê û rêwanî tînebû , Cegerxwîn got Hisko :

ez çî bikim Hisko tu axê keraye ! wê demê em buhitî man , me digot yaho Cegerxwîn dibê tu axê keraye . îro em di gotina Cegerxwîn de digên . dem nema bi paşde vedgere , pêşeroj wê ji mere bin. êvarekê deng giya gund ku paşî diroja gorişme heye , Turko rêbide. kêf xweşyê dilê gel girt . pirr kesa nexasim pîrek bi

119

sala dê û bavê xwe nedîtine . gorişme ji wan re cejneke mezine . gel wek kulî ji herdû aliyave girt biser sînora de .ji mêja sibêve Girsorya rê girtin . bêcirmanî û cibilgirawî , kermêtî û hatxî û herweha , wê şevê Simko wek zarokên din ji kêfa xew neket çava . di dilê xwe de digot ezê Fehîma qîza xalê xwe Ferhan û Zûbîda û Mihemedê Zarwê metka xwe Eysanê bi bînim . hat bîra wî çawa bi wan re bi axê dilîst dema hatibûn Girsor , bîranîna ew bir nav rezê Hatxê û Terê gava bi dû hev diketin . sibê zû giyan Doda . gel wek Gêrikê dilivî , sînora seranser ji xelkê hatibû dagirtin , te ax avêtiba li erdê nediket çiqasî çav di dît herdû alyê sînora , çep û rast , pikpikîne ji gel . Simko nêzîkî li têtê sînora kir serî hilda , ziq li pişt têtê nerî , dît çawa yek erd bi têtê û leşker hatiye dûbeşkirin , li azmana nerî teyrekî bilind diser wanre difri , xewst bibe teyrek baskê xwe jî pêre veke bifirê wî aliyê sînora. lê hat bîrê ku tenbî li wan kirin gotin : destê hev bigrin û hev bernedin , dûr meçin hûnê winda bibin . gel bi yek zimanî bi hev re dipeyvîn , zimanê kurdî bi deha deng bihev re dihatin guh . orta wan çar gav hebûn , vî alî têtê wî alî têtê leşkerê Turk di nav têtêde bi dara xelq di tirsandin . pevra dipeyvîn wek girtiyê du zîndana . deng car

120

carna ne zelal dihat yekî binxetî xwe avêt nav têtê xwest here merivê xwe himbêzke , leşker bi dara binav serê wî ketin , xwînê pijiqand , millet li herdû alyê da qir , dengê klaşînkova Turko ew qîr

qîr birî . geleka lêxistin xwarin û gelek camêra kêmanî daqûrtandin . gel wek pêlên derya bi ser hev diqulipîn . piştî Turko hinekî werîs sistkir , Simko , bi diya xwere serxet bû . bêriya lîska zaroka kiribû , digot qey wê têr bilîze lê berî hev xweş bibînîn leşker ferman da her yek vegere cê xwe tirs û tîrorê xwe berdabû şûnê , tirsî ku bi seda sal di mêjyê kurde hatiye meyndin . diya Simko hêsir barandin dema xatir ji dê û bav , xuh û birayê xwe xwest.

\_Simko got : çima wilo zû emê herin,  
\_dê gotê , lawo leşker dibêje binxet bibin.

\_binxet çiyê,  
\_yanî pişt têla.

ma hîn nelîstiyê . ev çî têlin,

\_xalê wî Ferhan dest di ser serê wîre bir û anî gotê : ev têl xwarzê derdê herî mezinin yê gel . dema tu mezin bibe tê tê bigihê.

lê Simko xwest bi Fehîma û Zibêda re bilîze, lê leşkerê Turk tiving hilda û da qîr , xalê wî rahiştê û avêt wîalî têla . Simko zîvirî ziq nerî rondika ( fermiska ) di ser hinarkê riwê wîde gindirîn.

121

lê dengê fîşeka nerîna Simko birand , gel lezand bi alyê teqînêve , Simko ket nav gel , teva da qîr û girî gotin leşkerê Turkoê Hov xortekî kurd kuştin ji ber hesabe gotina qumandarê Turk nekir.

bera xwedê nehêle , gel li herdû alyê têla nerazîbûna xwe diyardikirin.

kêfa wî lê şikest , xemgîniyê ew girt , şahî bû şîn . ne ewbin û ne gorişma wa be diya Simko bi qehr got.

bênderê gunda hatin dagirtin ji komê pûş . bavê Simko gotê her lawo tu û xuha xwe sêgulîka bînin û werin . Simko sêgulîk wek zîzokê Ajot û li şopa wê dinerî çawa xêzka cihê xwe di axê de çêdikirin .

Simko wek bavê xwe rahişt sêgulîkekî û pûş li dora benderê rastdikir wek ku tê rêkê çêbike , cencere siwarkirin qantir xistin ber , darek çikilandin di nîvê pûşde û werîsek jê avêtin serê qantira , ji bo ku qantir xetê bernedin Simko û xuh li cencerê Siwarbûn û dest bi gêrê kirin . bi wî rengî zêdî hevtîkî gêrê berdewam kir.

Ezîzê metka wan Pero alîkariya wan dikir. bi sêgulîka ( ka ) didan alî û pûş tavêtin pêşiya cencerê . cencere ji nişkave rawestiya , peyabin peyabin , Ezîz ji wanre got : cencere hilda pûş ji nav bivirê Cencerê da alî , got : cencere ( xeniqiye. (

122

bav gotê her lawo ji mere avin sar bîn . diya wî av ji denê bi çewal pêçayî dayê . ving vingê mêşa di ser serê wanre diçûn û dihatin . carna icacê hev digirt dibû zîzok û dilîst . rewrewk ji dûrve dihatin dîtin . qantir ne ji dil cencere dikşandin , germiyê sistî dida laş û xweydan pêdixsit , qilçixê kayê bi xweydana laş dizeliqîn . ji germê xewê avêt çavê Simko dikir di cencerê werba . bav ban kir got : werin firavînê bixwin , xwe rehetbikin . EbdilEzîz qantir vekirin , avdan , êmkirin û çûn hundir.

Li hêwanê rûniştin , li gor germiya derve, hêwan hênikbû , him hindirê ax û him deryê bakur û başûr beramber , hinek ba dida guhertin . mêşê cirnexweş nehiştin ne xweşik firavînê bixwin û ne xweşik razin . nîro meyilî , erd sincirî ji germê , zehmet te van çaxa kes li derve bidîta , teyir û tilûr ketin hêlînê xwe , ya jî xwe bicîkirin di ber siya tirmal û tûmika de li bende danê êvarê çavnêrîn dikirin , şîv pêwiste berî herin lûs. kûçikên herî har li ber siya dîwara navkut dikirin , cirxweş wek pisîkê navmalê.

\_malê , malê , deng ji derve hat.

\_derbasb , kiye , Hessîna pirsî.



\_roja we bixêr.

123

\_bixêr û serçava . Tirkiye rebenê ! me go ka bê kiye , wek şivanê meyî Ereb “ Keyafê “ dismal û igal daye serê xwe . ji xwe îro me digot em bişînin dû te , berxekî me li caxwe nabane , belkî tu wan li hev bi banîne.

\_berxê çî yadê , xelqê Hev kuştin , dinya li hev ket , tu dibê berxê me li miyê bi banîn!

\_kî rebeno,

\_bavê Simko xilmaşbû , rabû rûnişt . çî heye kê hev kuştiye Tirkî,  
\_mala kûtê û xelqê Qotikê , mala Kûtê yekî mala Mîrxên kuştin ,  
van jî yekî wan bi terekorê Perçiqandin . mala Kûtê barkirin celîbûn  
û çûn cem merivê xwe li şingalê , tenê Mehmûdê Kûtê barnekir.

\_ji mêjve gelac dinav wande dilîzin netebaya wan li ser erdaye.

\_yê revî revî , gund tije polîsin . Tirkî got û dismala serê xwe danî.

\_em pez diçêrînin , hukûmet jî me diçêrîne . bavê Simko got qutî  
da dest Tirkî. hukûmet dest navêje mesela heta xeranebe, deh sal  
din jî problêma wan bicînabe , wê hukûmet herdû alya bidoşe . ma  
emê çibikin , tişt ku xerabû zehmet bê avakirin. mesele ket destê  
hukûmetê . xwedê Abixêr bike û li qîza xwe bedia nerî gotê : çayek  
me çêk keça min.

124

piştî mêja esrê diya Simko nan li tenûrê dixist . Simko piskilêtê balon  
derxist xwest bajo , dê bi destê rastê rahişt paçikekî û nanek derxist  
û gotê : piskilêt mezine lawo, tê biserxwede bixe . lê Simko deng  
nebir xwe . nigê çepê danî ser dewasê biser piskilêt de ket . dîsa  
rabû , dîsa ket , dawî nigê rastê dinav lûlanre derbaskir û bi herdû  
linga li dewasa da wek yek nigê xwe li mekîna dirûtinê xe . çend cara

çû û ket . bi vî rengî fêrî ajotina piskilêt bû lê dinav lûlan re pisklêt jêre tiştêkî nû û mezine , nexasim ne her zarok li gund di kare bibe xwedî pisklêt . dan û sitandin li gel pisklêt ne tenê guhertinin taze naskirin wek : gîdon , dewase , zincîra pisklêt , zengilê pisklêt , lûle û her weha lê belê hişt bîr li pêdîtînin nû bike.

pisklêt roleke mezin dilîst di jiyana gundiyade ango ciyê trimpêla digirt . bêtir serenca Simko rakişandin siwarbûna pisklêt ji alyê kadirin ramyarî û mamostên gunda . ya didwa Simko wek her zarokê hevalên xwe yê gundiyan kurd bi lîskan şah nebûn û nedîtin.

danê êvarî gêrevanya xweş gêre dikirin . bi sêgulîka pûş ji benderê tavêtin ber lingê qantira . zîq zîq bi cencerê diket . hêdî hêdî bender biçûk dibû , pûşê Gêrekirî bu ( ka.(

125

roja din berî nîro binê benderê derket , gîsin ( sing ) dinîvê benderê de kutan û werîs avêtinê . Simko dît ji alyê riya gundê Kotiya şêxo malo rebenê kwîr û hitim bi dar riya xwe tajot . ji demê heta demê dihat gund û li mala Simko bi cî dibû . rebenekî bê kes û kûs . dema ghişt rasta benderê aliyê bareş , guh miçkirin da bi zanibe dengê kêye . Simko lê nerî û bi dengê xurt bi zimanê Erebi gotê : “qif ûlan” . şêxo malo hinekî pojînî û li Simko vegerand gotê :” siktir ûlan “. tîq tîq bi bavê Simko ket tev kenîn , ban şêxo malo kirin av danê ew birin malê.

êvarî şîva wan girar û goştê mirîşka bû . piştî mêja eşayê , meyra sar xwarin . dengê kûçikê şivana ji dûr ji nav pirêzena dihatin. şewqa perajektorê Turko rihî dida berya mêrdînê.

piştî du roja xort û keça girtin kayê , qîza şalik dixistin serê xwe û (ka ) dikişandin kadînê.

hejartî û belengazî girtibu ser piraniya gund . tenê çend mal di gund de hal xweşbûn . dema bavê Simko zad bi cî dikir. dişand dû feqîr û fuqra zike dida wan . paqijkirina genim carna dirêj dikir , nexasim yê bi zîwan û reşkok . bavê Simko kêstek û kevir danîn ser hev kir qûç da ba

126

rabe , genim di dêra wilo qilçix û gemar dihat paqijkirin ji genim . piştire li serad û bêjînga dixistin.

roja din beyanî zû , dê Simko û Bedîa şiyar kirin gote wan : rabin lawo herin nav bîstên , anha talik tevde di lema de xerabûne ev çend rojin we riya xwe pênexistiye . diya wan çavê wan şûşt û her kê hinek nanê bi qeymax da destê wan . Simko dixwar û li meşkê dinerî çawa diya wî dew dikila , zêdetir deh jinan di hewşêde kombûn , her yek beroş di dest de çavnerîna dew dikirin . diya Simko meşk da destê jinekê û çû têr danî ser kerê û zarok bi rêkirin.

bîstan diket pişt newala nêf , erdê şûvê dikşya bi alyê gundê Sêhremka de . dema gihiştin newala serê bîstên ji kerê peyabûn, bi serê rişma kerê girtin birin ser ava ku hîn di newalê de ji ber baran û lehiyê mayî, kerê devê xwe li avê da , ne pir vexwar , bi terya xwe bera mêşekê da , piştire singê kerê bi kevirê baş kutan , çûn bin konkê nav bîstên . li hawirdor bîstan dihatin dîtin, gulê ber bero sîngên xwe dabûn rojê, dibin bayê sibê ê hênik çep û rast dihejiyan, çûk û çivîlok taştiya xwe peyda dikirin , bêdengiyeke sêr girtibû ser çolê , ji alyê gundê Nêf bozîngê toz û ecac bi dû

127

xwede berdida , kesek di bin nîşana serê girde dihate dîtin . kerekî bi zirzira xwe bê dengî şikand . Bedîa ban Simko kir gotê : were va hiliqs milqs.

Simko bi bazdan hat , rûnişt û herdiwa bihevre bi yek dengî gotin : hilqis milqis biraqis , hilqis milqis biraqis û dûbare kirin.

Kurmkên hevgirtî dîlan girtin xwe hildan jor daxistin jêr . Simko kenî bi zimanê zaroktî got , çî xweşikîn.

rab birê min berî bibe germ Bedîa got Simko , lemê talik û şebeşa rêz bi rêz li ser riwê erdê şaxê xwe vedabûn . bi deha şebeş û talik di bin wande cihê xwe xweşkiribûn.

lê Simko berê xwe da lemê icûra , çend lemê şimamoka liwir hatibûn çandin . xuhê da dû , Simko şimamokek jêkir û da ber bêvla xwe bêhnkir , ooooooh çî bihna xweş jê tê . piştî li genekê nerîn û dest bi çinîna icûra kirin , ê bicûcik jênek ha birê min , xuhê gotê.

\_ih , tidibê qey ez nizanim ! Simko vegerand . gelek wext derbas nebû , komek talik û şebeşên renga reng jêkirin . talikekî tenûrî şikandin şêrîn û tirş . dûrakê her yekî jiwan şebeşekî ne mezin şikenandin û ava wî vexwarin . ker anîn ber koma şebeş

128

û talika , têr danîn ser piştî kerê herdû law ( alî ) dagirtin , heta kerê qaşilê ber xwe xwarin Badîa çend lemên hişk rakirin bo dermalê , avêt ser piştî kerê , ker ajotin û dan dû.

destpêka payizê gundî xwe diguherin hundura binê oda bi heryê diseyandin , qulê mişk û tûpişka bi kevira digirtin . xewa derve nema saxlemiyê dide can . xelqê wek gêrikê karê xwe û çele dikirin (sefik( imbar \_ kunc , hundur dagirtin ji arvan û qût . hîz tijî rûn , çekur dan ber goştê xwêkirî yê dermala , qelî xistin kwîza , kadîn tije ( ka ) û rêsi , tepik ji kozika kişandin bi cîkirin . axurê dewara û koxikê mirîşka pak kirin . dîwar û serxaniya dan ber seyandinê . feqîr û pepûk û reben , yên bê dermale , divê saleke rij derbasbikin . gelo arvanê wan wê wan bi salê xe,

Simko wê payizê sinifê didwaye . pirtûka nû di deste , pel bi pel ji ser hev radikir li rismên rengok dinerî , diya wî hevîrdikir , bav ket hundur pirsî : ka Hessîna ew gîsin li kuye , gîsinê çi , jinê lê vegerand , mane wa teraktor erd radike , tê dîsa here cot , tê çibike, \_cotê çi lê ! teraktora kar ji gîsinre nehişt , mi got ezê qeyda mehîne bavêjimê.

129

\_li kuncêye.

jinek ji cînara hate mala wan , hevîrtirş dixwest . hîn willo qereçiyekê xwe dihejand ket hundur:

\_siba we bixêr malê.

\_bixêr û ser çava.

\_ma hûn ji vê gerê naqerin lê , diya Simko jê pirsî.

\_ka ka geşta me bide me , me birêk.

\_diya Simko jêre sênîk genim anî û nanek dayê , xist turikê xwe û benîştê dara derxist, ka ka genimnî din bide min ji we benîşt bo zaroka.

\_keçê ti can û ciwane , natirse kesek te têxe hundur , jina cînarkî ji qereçiyê pirsî.

\_ma kesî tu xistiye hundura , qereçiyê lê vegerand.

\_nebxêr gotinê we di birîka we dene .rabe bi riya xwe de here.

\_ka tasik av ez tîme.

\_qereçiyê ava xwe vexwar bizendikê xwe devê xwe paqêjkir nuh derket , didwên din derbas bûn.

\_nebxêr , karekî me nema ji qereçiya pêve. diya Simko diberxwede got.

dema Simko dengê qitk û ordeka bihîst , pirtûk bi cî hişt , bazda ser derenca deryê bakur , ziq li refên quling û ordek û qitka nerî . her

refek bi dû serdarê xwede bi rêk û pêk difirî . baskê wan hêviya  
jiyana

130

paşeroj dida wan . stranê wan kêfxweşî dixist dil û ciwanî dida çol û  
pol.

\_bêxwediya kuro bê çi xweşik difirin , rêzê rast , Ibrahîmê Hemo li  
pişt dîwarê dikê got.

\_ma ne sêre lo , berî ku em karê çele bikin, teyir û tilûr û kurmikê  
erdê dikin . Sebriyê Seyid Yaqub got û komê Xwe rastkir.

\_qey çilo karê çele dikin , Simko ji diya xwe pirsî,

\_kurê mi , berî çele ji bakur di firin başûr , ji ber çele li bakur sare.

\_ma ji ku tîn.

\_ez ji kuza lawo . qey ji cem mala xalanê te ji serxetê tîn.

refekî nû xuyakir , Simko destê rastê hilda ji wanre hejand hêêê hêê  
dengê wî bi ezmana de çû , ref bi stran lê vegerandin.

ji nav gund Xelê Hisko derket û çiftak di destê . berê çiftê da refê  
qitka , tilî danî ser zînadê û teqand.

\_ha hew te tirînê jê anî , bê çi nîşanvane lo, Helîmê Evdîko bi ken  
henek bi Xelo kir.

\_hişşşş , gû box , kûçik , Xelo lê vegerand.

ma te çi ji van belengazaye Xelo , bera bi riya xwede herin . Xelefê  
Silto xwe avêt nav gotinê.

\_di jina xwedyê wanîm , di jina xwedyê wanîm Xelo bi devê xweyê  
sivik gotin dûbarekir . careke din berê çiftê hilda jor,

131

bi teqandinê Ve qitkek hate xwar . gule sînga wê girt . zaroka êrîş  
kirinê anîn , Xelo çixare pêxist , di bin simbêlare kenî . Simko dinava  
xwede xeyidî , di dilê xwede got : çima ev çûka xweşik kuşt ! hîn

wilo , apê wî Sebrî , derdê wî derman kir dema ji Xelê Kurê axê pirsî  
:

\_mal nexerab , ma tê bi vê pepûkê bi salêkevê te ew ji hevalê wê  
veqetand û pêre te strana wê ya payizî kuşt , te nehişt bi refê xwere  
bi gê çî . vê gotina han dilê Simko rehet kir lê her ma xemgîn.  
diwirde , gotin hat guhertin Hilal li Simko nerrî gotê : mamostê we  
giya , ica zîzok mîzok kab mab neman , kenî destê rastê danî ser serê  
wî.

\_çi kese , ji koyê , Biroka pirsî.

\_ma wê ji kube , sed bi sedî ne ji herêmêye.

\_mêrik xelqê Hemaye , kunya wî beraziye.

\_em û wan wek hev bindestê Osmaniya de bûn , ev deh sale ku bûn  
welat û wan îca em bindestkirin .û mamostayê li me dikin.

\_kûçik bav ne kurdbi lo , Ibrahîmê Hemo pirsî!

\_berê wele , te tê derxist , bi esl kurde.

\_ma kurd li Hema hene , çilo giyan wir , Mehmûdê Gulê pirsî.

\_Hilal pê kenî , gotê : bav û kalê teyê kurd li Misir û Yemenê hukum  
di kirin . dibe tu

132

pirske , çilo ghiştin Hemayê .Hema tije gundê kurdane , hîn ji dema  
Selahdîn eyûbî ve li wandera bicî bûne.

\_kurd têra xwe hene , Ezîzê Xanê got , destê xwe da pişt quna xwe  
û civat berda.

\_ma kirîvê Hilal Selahedîn kurde , Ebdilê Hussên Hemê pirsî.

\_ma tu nizane ku kurde , naxwe çiyê , Izêro bi zirt lê veqerand.

\_ma ez feqîrê xwedê ji kuzanim ma ez xwendevaim ez çime,

\_tîq tîq bi civatê ket , lê tîq tîqa Sebrî bi ser teva ket , gotê kûçkê  
bigû te çî ji van pirsaye.

\_yabo , bixwedê min jî nizaîbû ku Selahedîn kurde , Emînkê Rihê bi gotina xwe barê Ebdule sivik kir.

\_ev tu bêjiye , tu çiyê Hilal , tu ji ku vaqasa tuştê dizane ,Turkiyê Hacî Mehmûdê pirs vekirî hişt.

\_mane kurê Xelefê Botiyaye , Helîm bi ken got.

û gotina xwe berdewamkir , bavê wî ji mal xeyidî , piştê di ber mala xwere bûrî ,jinê gotê : Xeleeeef neletê li şeytan bîn , wer mala xwe . gotê : tu kiye yadê , tu çî dixwaze , ez te nasnakim ! tîq tîq bi civatê ket.

\_Ezzê Ehmedê Gulê gotin zû ji Helîm girt û bi qeşmerî got : na a xweş ewe çawa

133

Xelefê Botî zembîl da ber xwe , dema kurê wî Xeto lê da çiftê . dîsa civat kenî.

\_erê meznaya xwedê , gotin bi serê xweye. erê meznaya xwedê , Xeto gotin dûbare kir, ez çûmê zembîl da berxwe , zembîl kuro , Xeto kenî.

\_hûn zarwê mala gulê , tidbê qey we instîtûta avoqatyê tewaw kiriye . Hilal bersiva Ezzê da.

gotin diwirde hate birîn , bala gişa çû ser dû dîka ( keleşêr ) , dema li ser sergo li ser mirîşkekê herdiwa şerkirin . civat ji ser tirmê Nêzîka sergo belawela bû . Simko çû hewşê piskilêtê balon derxist , nigê çepê danî ser dewasê , piskilêt da pêş , lingê rastê avêt ser piskilêt , nig bi zorê giyan dewasa , destpêkê hinekî tirsê ew girt, piştê baweriya wî bi wî hat û xwe dît kêfxweş û ciwan.

li şûna civatê man dukes , li kêleka dîwêr qelevîska rûniştin . Ibrahîmkê Hemo çixare pêxist û qutî da destê Hilal û jê pirsî:



\_îro ez ji bajêr hatim , min ji xortnî sor bihîst ku rêjîm nêzîk wê gel bihejmêre . ma ev tişt raste gelo , hûn çi dizanin li ser vê meselê,  
\_raste ezbenî , Hilal bi qirşikekî xêzk li erdê çêkir , û berdewam kir got : berî hevteyêkê Rêjîmê zakona binavê not û sisya

134

derxist bo pêkanîna hejmartina gel li navçê cezîrê û hevala di kenalê xweyê ye taybetî naskirin ku armanc ji vê gavê ewe kurda ji erdê wan derxin bi hiceta ku kurd ji serxetê “ bi dizî “ derbasî vir bûne piştî şikestina şoreşa şêx Seîdê Pîran.

\_ma serok Nasir vî tiştî qebûl dike,  
\_eger qebûl nekira , ev tişt pêk nedihat , îro roj ew hukum tajo , berî du sala kolonêl sarac bi şêwra Nasir hevalê kumîta berêvebir girtin . li wandan , zindankirin.

\_başê berî demekê we digot ku Berzanî bû mêvanê Nasir , li kayro û Nasir roleke mezin lîst di vegera serok Berzanî de , hûn çawa di meselê de digên,

\_ez dibînim tu bûye siyaset medar , Hilal biken got , çixarek dinav tilyê xwede pêça bi çixatê pêxist hilmek lê da û got : ev mesele gerek bê enalîzekirin û jihev bê derxistin . tiştê ku ez têdigem Nasir piştevaniya kurda kir û izgehek li Misirê Vekir bo qezenckirina çend tiştê wek xurtkirina rêjîma qasim û helweşandina pakta bexda û wergirtina piştevaniya soviyet û kurda , ji ber Nasir xwe dibîne serokê hemû rojhelata navîn û rolekê di tevgera netebayityêde ( serbixwe ) dilîze.

\_naxwe ev çi pilanin dijî kurda têne kirin.,

135

\_diyare ku Nasir li têla tembûra natsionalîstên regezperestên ereb dixwe . ew bixwe ji despêkêde bi polîsî hukum dike . şofînîstên ereb

sed hesab ji tevgera gelê me dike , nexasim piştî pêxistina serhildana netewî li perçê başûr.

zarokekî çend mî dabû pêşya xwe di berwanre bûrî , du çûkin beytik dilîstin bi dûhevde wek du balefira xwe nêzîkê erdê kirin di berwanre xwe hildan jor , serê diya Ibrahîmkko ji sikakê derket , destê çepê dabû piştî xwe kopal di destê rastê de.

\_heyla xwedê hiştî , ti bi vî bêkarîre rûniştîye û pez dihewşêde hîn mexele . Sara Magê Got kurê xwe.

\_ma colka pez dernexistîye , wê bibin , kur li dê vegerand.

\_erê tu bikude dire , wek pîra sêr ! Hilal pirsî.

\_mine ezê di riya bavê tede birîm ha ! pîra Magê , têra xwe kenî , got ez dirim mala Seyid . Fadya û Barî bibêm mala kalkê wan.

\_ka bêje , te çilo kurê Ermenî ji turko rizgarkir,

\_turko bi saxî Ermen davêtin bîra qijnikê . leşker mal bi mal li Ermena di geriyan . li gundê Hacî nasir dema leşkerê turk derbasî hundur bûn min kurikê Ermenî xist nav

136

nigê xwe û dawa xwe avête ser . dil leşkerde ez avisim.

\_eferim , te karekî mezin kiriye.

du heyv bûrîn , meha payîzê ya dawî hat. çol û dever çavnerîna baranê dikirin , tîrêjê rokê kirasê germiyê ji xwe avêt . qutabxana sînga xwe ji qutabiyare vekirin . lûlê soba bi ser xaniya diketin çavnêrina sermê dikirin . jiyana gel wek jiyana bav û kala di devê şûşerê dihat derbaskirin . çend zehmetî û nexweşî li hawirdor , dîsa jiyana xweş dihat dîtin , didan şopa bav û kalan , eve qedera gel . divê bijîn , jiyana şêrîne , berxwedan jiyane . payiza dawî karê xwe û barkirinê dikir , divê cih bide zivistanê.

rojekê ji wan rojan du cêb ketin gund tijî polîs û çend sivîl biwanre. zîlamê axê bi nav gund ketin , piyaw xwestin odê , oda axê pikpikî ji gundiya , bêdengiyê ode girt , gundî ketin hev , tişteke heye lê çiyê nizanin. qehweçî qehwe gerand , dest pêkir ji xwediyê şifqa . axê û zarwên xwe zêde li ber mêvanan dihil hilîn . axê dîwarê bêdengiyê şikand got:

gelî gundiya , evkesana nûnerê rêjîmêne , hatine bo hijmartina gundiya , kê ji we bixwazin , divê hûn pirsê wan rast bidin , navê zarwê xwe bêjin , kî ji ku hatiye cem min û herweha , rabin odê valebikin , wê

137

we yek bi yek bi xwazin . civatê bilez ode berda , li derve çavnerîn kirin.

li hundur polîs bi tiving û demançe , sivîl pênivîs di dest wande , defter vekirin pişt û kêlekê wan tijî balîf , axê xwe ji wanre kir şîretvan û peyak ji peyê xwe kir dergevan û dest bi planê xwe kirin , nav xwestin.

\_Hesenê çeto , dergevan ew xwest .berî jê pirske axê got ev peyayekî dilsoze , ji bav û kala li vire.

destpêkêde , navê rênçber û peya û kesê pêre xwestin . axê got evana ji bav û kalan li virin . piştî navin kesên ne benda axê xwestin.

\_Husênê Hemê.

\_ezim , ezim , diberxwede got , bê hemdî xwe beşîşî , çavê wî şîndikir dinav dismala serê wîde.

\_navê te çiyê , tu ji ku hatiye vir,

\_navê min Hesenê Hemêye , ez ji .... , berî gotina xwe bi bêje axê gotin ji dest girt û got:

ev zilam ji turkiye hatiye cem min , xelqê Cibilgirawêye.

\_raste ev gotin , nivîsvan jê pirsî,

\_erê erê Hesên di berxwede got.

\_rabe derkeve.

\_Cemîl hussên.

\_Cemo ket hundur . xortekî kinikî , zend badayî bêvil qutî bilind.

138

\_ev mehcire , axe got , sêwî mezin bû , diya wî ew xwedî kirin.

\_ez li vir çêbûme axe.

\_birê te Receb raste livir çêbû lê tu na , axe got.

\_eger birê min ji min mestire , ew livir çêbûye , yanî ejî li vir bûme

\_na tu li jor çêbûye . axe gotin wergerand Erebi û hate nivîsîn.

\_ji xwere got çend sîre eger birê minî mezin Recebê li vir çêbûye , çilo ez li jor çêbûme , bixwedê ku tu min li merîx binivîse ez nabim benda te , benda pîs û gemar.

\_Xetê Botî . Xeto ket hundur dismala serê xwe avêt piştî hustê xwe . qayîş di newqêde li ber wan xwe berda ser herdû kaboka.

\_navî te û ji ku hatiye,

\_Xeto Xelef Botî . ez ji Fayîc hatime vir.

\_mamûr bi dizî ji axe pirsî , ev nav bi mere derbas bû,

\_raste , birayê wî gundiya li min fêrdike , lê ev bixwe mêşinîye.

piştî mamûr navê Mihemedê Seyid xwest.

\_Mihemedê Seyid ket hundur , cilê wî paqij zincîra seeta bêrîkê ji êşlek hatibû daleqandin , çavê wî yê hungovî dinava serê wîde dilîst

139

\_navê te çiyê,

\_Mihemed Seyid Silo.

\_berî ku tu bê vî gundî tu li ku dima , mamûr pirsî

\_ji Bêcirman hatiye , xelkê Bêcirmane , Hisko axe bersiva mamûr da

\_hêrza Mihemdê Seyid girt , li dora xwe nerî bi qehr ji axe pirsî.

\_di dînê tede , Hisko , ez ji Bêcirman hatime Girsor , ya ez ji Herem reş hatime,

\_ji Bêcirman hatiye , axe dûbare kir , mamûr nivîsî.

< \_ne tu ji xwe fedîname , te fedîkiriba te wilo nedikir . ma tu ji ku hatiye vir , ya ava te û wan di yek cokê de diherike . ne tu xelqê Remyê , tu ji nav Rema hatiye . şerme , çima mamûr nanivîse ku tu xelqê Remye , şerme , bi zirt Mihemedê Seyid got û derket . ji koma zilama re got : Cegerxwîn digot ma ezê çibkim Hisko , mane tu axê keraye . îro me naskir ku Cegerxwîn ji mere digot . û bi xeyd berê xwe da mal . hêrza ew girt , naskir ku axe dijî gundiye Xwe dixebite . ket xem û xeyala , xelekên bîranînên kevin diber çavê wîre derbas bûn .zaroktiya wî hat bîrê , biçûkê malê bû , delalî hat xwedî kirin , mala mezin xêr û bêr . serxet û binxet , dilê wî hat guvaştin , mijankê çav hejîn , dema mirna diya wî hat bîrê , xwest bigrî

140

li hêsr nehatin xwar . tirba dê li Girmîr . çend sêre ji xere got . çilo du hevtî nekevin navbera mirna dê û jinbavê . du turb li Girmîr . tirba Horî û Qumrî . belengazê bav , Seyid Silo , ew zilamê bi saw û mêt , çend sala ma bê jin . herdû pîrekên xwe di du hevtiyade windakirin . piştire hate bîrê , çawa çûn Herem reş . evqas dema dirêj , wek ku doh pêkhatibe.

ji xwere got , go dinya dehle . xurt qelsa dixwin . ax , eger kurê Xêlid fen û hîla li min nekiriba , îro ezê xwedî gund bama , tu carî mero

baweriyê Bi kesî neyînê , çilo min pere danê , ku erd ji min û xwere bikire , çû erd li ser navê xwe topo kir bê wicdan derket . ji xwe , Hisko heta dinya eşîr û êlbûn , pêwestiya wî bi me hebû , li ser prinsipê : Milla berra Kîka dan . hat bîra wî ew şeva reş û tarî , dema Hisko , şand dû , gotê , çend xorta bineqîn û her li talanê Temikax , heta metirsiya axê ji eşîra hebû ew delalî bûn , go dinya bû hûkûmet, destê xwe avêt rêjîmê serdest , û dijî kê !! dijî gundiye belengaz , dijî gelê xwe , kulma xwe bi qehr anî hev , çavê wî ferehbûn , ziq li qurzîkê nerî , got : Hisko bê nan û xwê derket , man mana xurtaye , biryar da go sînga xwe têxe sînga axê heta dawî û jêre bibe himber.

141

ji wê rojêde , bi mirantî û eşkere benda dijî axê ajot , mala xwe kir ode ji heval bendên gundire û vekir ji kadirên partiyêre.

demek di wê navêre bûrî , pirr nav di lîstên serjimêrde nehatin nivisandin wek weten daş , kadirên partî ji gundiya xwestin gilî bikin , nifus û tapo û dokûmentên kevin bidin ber çav . bi gilîkirnê gelek nav nû derketin ji wan mala Simko , lê piştî ku hukumetê nivê behra berê ji erdê neda wan.

civata şev û roj li ser vê pirsê disekinîn.

\_kuro , tiştê kesa nedîtî , îro min yek li ber deryê qaymeqam dît , digot , navê min di serjimarêde hatiye û yê kurê min dernwçûye . de îca wrin vê ecêbê , ma ev kur ji ku hatiye , yekî got.

\_xwedê ji te razî , xweska bi yekî û deha ba , bi seda nemûne wilo hene . hinek navê kur hatiye , yê bav ne hatiye . navê birakî hatiye , yê din nehatiye .tiştin bêqûnî hatine kirin.

\_zilm û zora ku bav û kalên me dîtin xuyaye wê bigê zarwê me.

\_urus hatin giyan kevrê qul , Mihemed got , xelqê digot belkû orus alîkariya me bikin û me rizgarbikin . xuyaye demeke dirêj ji mere divê . em nezanin tê bîra te sala Cegerxwîn li ser dika odê , ji Hisko re

142

got : ma ezê çibkim Hisko , tu axê keraye ! me nizanîbû ku Cegerxwîn ji mere dibêje . îro me xwe ji axê naskir . lê gelek tişt hene em têngahin û nizanin çima çêdibe,

\_kuro , berê min ji were gotiye : kesê ne kes nabe kes kurtanê kerê nabe etles Sebrî got . em bi xerabare ketinê û dest avêt simbêlê xweyê zer û qalind bi jorde bada.

\_xwedê , ji ware nehêle , xwedê . ev gundana xelqê bi xwîna xwe avakirin , bi sedê salan ev erda bejî bi gîsin û tevşîwa û qazma û tevrika hate rakirin , îro bi rehetî , di xwazin bixwin . ji ku ji mere derketin , kes nizane bê bezê bin guhê bavê wan ji kuye , Mihemedê Seyid got . niza ev xelq doza çî li hev dikan , bîst welatê wan hene , ewqas erd dibin destê wande , hatine vê qorzîka me ji me bistînin . me tu rehetî nedît . em hatin dinê , me çavê xwe vekir , dibin zilma Turkode . kal û bavê me û wan wek hev bindest bûn . xwe kirin welat û cihê Turko girtin.

\_tîq tîq bi Sebrî ket , got Mihemed tê bîra te , çiqas car me ji ber wan cendirmanana bazda , li vir îca birehetî em zeftkirin.

\_xwedê mezine wê roja me bê ( derkeve. (

Wê salê biser wade zivistanek sar û têt berf girt . diya Simko gorê hirî xistin linga , kenzakî germ lêkir , kumê wî xist serê wî , tenê çavê wî ma li derve . Simko potîn li

143

xwe kir , rahişt çentê xwe , berê xwe da qutabxanê . her pênc sinif di yek odê de dixwendin . zaroka dest dixistin bêrîka , yan pif dikirnê û xwe diqurnisandin ji ber serma li oda dubistanê , lê tiştê baş ku odê dilop nedikir ji ber sac danîbûn ser beşta . mamoste çend deqa ders da sinfê pênc piştire tembî li didwa ji wan kir ku dersê zaroka bidne wan û mamoste çû oda xwe ber sobê.

Demek bûrî , zarokek girya bû qîr qîrê wî : ay yabo zikê mi çû , ay zikê mi . Ekremê Xelefko çû li deryê mamoste xist , jêre got zarokek nexweşe . mamoste got zaroka herin malê xwe û ji ber ku Nêfî û Kotiyayî nehatine sibe jî neyên , lê ji bîr nekir tenbiya xwarina xwe kir . bike Simko rahişt çentê xwe û da nav zaroka.

Dema zarok roja didwa hatin qutabxanê dîtîn ku hevalê wan ê berî du roja nexweş nehatiye , piştire naskirin ku bavê wî Kerîmê Qut ew ji dibistanê derxist û gotê : kurê mi madam ku cil tune em li xwekin û em têr nan naxun çî qutabxane ji mere gereke , nema herin xwendinê ne tu û ne birayê te . buharî zaroka li ber dibistanê dilîstin dîtîn Beşîrê kerîmê Qut alî birê xwe şivantiyê dike . pez tajot û ziq bi keser li hevalê xwe dinerî , eger bi destê wî ba

144

belkî pez bi çî bihişta û hatiba xwendinê . Simko tenê li ber dîwarê başûr yê qutabxanê qelavîska rûniştibû û di berxwede distra û li buharê dinerî çawa geş dikir , tu nabê mamoste xwe di qorziya dîwar alyê rojava veşartibû û kêfxweş li Simko dinerî çawa distrê . dema Simko mamoste dît , şermkir , mamoste kenî û dest diser serê wîre bir û anî.

wê şevê çend kadirê partiyê ketin gund di nav wande Seîdê Barûdo ji Qoşanê , Elî Siwêdî ji Girçûk , Mihemedê Hesenê Mistê û mamoste <bid ji ElîFero , Restemê Mele şamo ji Kotiya , û Cemîlê Ezzo ji



gerdêwan Hamîdê Kodo û Hissênê Hacî Dawud . bi hevalê girsore li ser serhildana gelê kurd li kurdistana başûr peyîvîn . destpêkê indamê komîta navendî li ser hoyên rabûna şoreşê rawestiya û got

:

jeneral Qasim zêdegavî kir û rabû bi helmet dijî gelê kurd di berjewendiya kevneperest û regzperest û zengînên Erebi û hemû berhem û destkevtin tevde avêtin û hawbaşê doh ji xwere kir dijmin. Qasim ala şer dijî gelê kurd hilda . ev çend mehin ku rêjîma bexdê bi tenk û top û balefir êrîş dika ser gund û bajarê kurda , di xwaze gelê kurd tune bike . rêjîmê kurd neçar kirin ku têkeve çiya û li berxwebide û

145

zarok û jin û kala bi parêzin ji qirkirnê . şoreşa 11 îlonê bi pêşkêşiya P – D – k . û bi serokatiya Mele Mustefa Berzanî şoreşa kurd serdemeke nûye di dîroka gelê mede . bimre koledar bijî kurdistan , biva gotina berpirsiyar gotina xwe tewawkir.

\_heval tu çi dizane li ser charectrê Berzanî, yekî ji hevala pirsî,  
\_Berzan bixwe eşîreke kurde navçe binavê wan tête naskirin , roleke mezin lîstin di dîroka gelê mede .nemaze dîroka nûjen . Mistefa Berzanî . beşdarî di şoreşên navbera herdû şerên cîhanîde kiriye û yek ji berêvebirê komara Mehabatê dihate nasîn . paşî rûxandîna komara kurd koçberî sovyetistanê kir , li wira dan û standinê wî firehtirbûn hate naskirin wek serokekî kurd , têkilyê wî çêbûn li gel serokên soveytistanê û li gel roşenbîr û siyasetmedarên kurd li sovyetistanê û li gel opozatsîona <raqî li derve.

\_wekî din kî tê naskirin piştî Berzanî,

\_xortek zana û jêhatî heye Celal Talibanî . dibêjin pirr zaneye .pirr kesên din hene wek Ibrahim Ehmed wek Hemza Ebdella û herweha

roja din sê heval riya xwe bi malê dosta xistin , alîkarî bo şoreşê , li gel dest tengaya gundiya , lê dîsa tiştê ji wan dihat didan.

146

nîro kadir li mala bavê Simko firavîn xwarin , girara ser tije goştê mirîşka û tirşika petata hat berwan . selahîk qizêz dagirtî dewê Sibê . kevçî li girarê xistin , yekî ji wan got : gidî derî bigrin kes bi sermede neyê dinya rojîye . yê din got : bi telaq ku gundî bizanibin em ne bi rojîne , firingî bin bi qul nadin me , nexasim em li mala Seyid ronîştîne , serê xwe hilda çavê wî ket tûrkê quranê li dîwarê başûr daliqandî bi ser tentenên ciwande . ji derve qebqeba kevokekê dihat , berî mêvan ji ser xwarinê rabin . teşt hat danîn , Simko , qelewîzka li kêleka teştê rûnişt , dismal li ser milê wî , misînê tije ava gerim li ber.

mêvanê pêşî rabû , sabûn bi dest girt , Simko ava germ li dest kir . dest û devê xwe bi avê şûşt . li dîwarê bakur nerî dît çend partirit daliqandîne . yek ji wan partirita bavê Simko , simbêl bi jorde badayî , bi kum û lefahî ser pêçaye qayîşa demaça qerelo di nowqêde . li Simko nerî gotê : ti li me mukur neyê , ji kesîre nebêje ku mêvanê me ne bi rojîne . Simko beşişî . çavê wî wek du stêra dicirisandin.

\_kuro de bera bi zanibin ku em rojîye nagrin , dibe ew jî nema bigrin , aqlê wan bê serê wan.

147

\_waweylê yabo , ma naxwe yê rojî digre dihne.

\_na xaltîkê , Hemîdê Kodo heneka dike.

\_na na bi xwedê , ku bi destê min be , ez nahêlim yek rojî bigre.

\_ez êzîdîme , Yûsivê Dîbo got.

\_ma hevalê tejî êzîdîne keko , diya Simko pirsî,

\_hevalê min berê êzîdîbûn , di demên kevnarde em giş zeradeştîbûn. lê diya Simko hîc di gotina wîde têngihişt.

piştire rojî ne sî roje , lê sê roje . gotin Remo sê roj . Remo kerrbû deng neçûyê , got : sî \_ sê \_ sî \_ sê \_ sî \_ sê \_ sî \_ bivî rîngî ma sî roj

.

bavê Simko , kevaniya xwe xewlekir , gotê : kanî wan perê ku min berx pê firotibûn.

\_çima , qey ti bi cînade here,

\_na ev xort alîkariyê dixwazin bo Berzanî, bi rastî min digot ezê biwan ji zarokare cil û bergê cejna rojiyê bikrim

\_xema nexwe , jinê gotê wa maşelê min di kulekêde avêtine , ji roja Zekoka min û piştire Rebîaa mirin min ew li xwe nekirine wan bifroş çara xwe pê bik.

\_tê çî dibêje , ma em li erdê mane , zêrê xwe hilîn.

Simko bi dizî got diya xwe , ku wa toza trimpêlekê ji riya Amûdê xuyadike , dibe

148

polîs be . dê bi lez nerî , dema trimpêlê nêzîkayê kir hat naskirin . bi lez mêvan xistin odekê , derî li wan girtin . zarok şîret kirin , man bi tirs . Simko çû ber dîwarê camiyê beramberî oda axê , dema cêba polîs ji gund derket , bi bazdan Simko , xeber da wan.

Bi sihorave Simko , li ser dengê teneka melê û li ser dengê dê û bav şiyarbû . bav gotê razê lawo razê , lê dê gotê ti dixwaze rabe wer . Simko ser xwarinê rûnişt . hinek helaw û mast xwar . çû nav cihê xwe , bav gotê ma te nêta xwe li rojiyê anîye û pêre kenî . piştî du roja bav ew birin Qamişlo cilê eydê Jiware bikire . her yek kirasek û

tiragek û demaçak derbik . bi paytonê vegeerîn gund . çawa peyabûn  
<ssa hat pêşiya wan got : Bedîaa mane me şekir xwar . Bedîaa dest  
bi girî kir bû nûz nûzê wê . dê gotê keça min em ji bajêr tîn bav ji  
were her tişt kirî û hûn birin nanxanê û ji were çilekî milekî kirîn . ti  
digrî çima birê te du lib şekir li gund xwarin . hêsrê wê paqij kir ,  
gotê : em herin hundur fistan û qundra te li tekin , Bedîaa şekir ji  
bîr kir û bi kêf bazda hundur gulîka wê çû vî alî wî alî.

êvara cejnê , berî xewê , diya wan destê wan hine kir û bi paçika  
girêda . sibê bi

149

tarîbûnêve rabûn serxwe . destê xwe vekirin . dê nanê bi qeymax  
da wan got wan piştî gerê şorbe şîrê bixwin . zaroka pêşiya gir dest  
bi gerê kirin , çûn pêşiya pîreka , jinên çav tije hêsêr şekir didan wan  
, jin diçûn ser tirba , li ser miryê xwe digiryan . zîlam û xort yasîn  
dixwendin . lê zarok derdê wan yê pêşî komkirina şekirbû. zarok hiş  
jiyana bê hêsêr dikin . piştî zarok wek mezna mal bi mal gerîn ,  
kîskê wan hatin dagirtin . Simko , devê kîsê birê xwe Sulêman yê du  
salî girêda , bi destê wî girt hatin malê.

kêfê gund girt , cejne , cejneki ciwane , ewe demeke zarok çavnerîna  
vê rojê dikin . qîza xwe edilandin , cilê renga reng li xwe kirin , xeml  
û xêz li xwe kirin ji hewşekê di ketin ya din . hewşa mala Simko hat  
dagirtin ji qîza , ketin hêlanê , şêrîna Nofka keça qert ban Simko kir  
, wer bi minre têkev hêlanê , Simko bi şermî çû , li ser werîsekî rûnişt  
, şêrînê nigê xwe dirêjî nav şeqê Simko kir , her çar nig derbasî nav  
hev bûn , hev zeftkirin . du keça bi stran ew hejandin , ev cara pêşîye  
ku laşê Simko bivî rengî digê laşê qîzekê . tevzînoka laşê wî girt , xwe  
di mînotêde dît xort . lê bala wî çû ser çepk û stranê keça û bi herdû  
desta xwe baş bi herdû werîsa girt . danê

150

êvarî , şeqalê Gir tev hatin dagirtin ji keç û xort , sîpê nava gund .  
keça bi hiqê dilîstin, xwe diser benave tavêtin , distran , dilîlandin .  
xorta bi xar û kab yan bi laga yan bi çirrê dilîstin . çend zilam li binê  
nîşanê berê xwe dabûn çayê şingalê yê dûr. li ser bêndera , xortên  
qert bi gokê di lîstin.

roja din Simko , şekirê xwe derxist , naskir birayê wî Hayis hinek jê  
derxistîye . Simko , gilyê xwe bi diya xwe kir : dîsa Hayis , şekrê min  
derxistiye , mane ê wî jî qendir ê minin.

dê bi kurê biçûk xeyidî , gotê : tu çiqas cirnexweşe “ Xelefê Hûtê “ ,  
çênabe ti dest bavê ne tiştê xwe . lê kur mandelekir , got : hîç hayê  
min jê tine . Simko rahişt kisê şekirê kaxeta , got : ez dizanim  
dermanê şekir çiyê . çû ser bêndera , bakurî gund , beramberî malê  
rûnişt û dest bi xwarina şekir kir , bi deha kaxitê şekir sor û zer , kesk  
û pemba , şîn û sipî li ber ba bela wela bûn . dora Simko xemilî ji  
kaxitê renge ciwan . xûşk û bira bûn temaşevan.

\_waweylê waweylê , rebeno , te evqas şekir xwar , xûşka wî Bedîaa  
gotê.

\_wilo çêtire , zik baştirîn cihe , nema Hayis dikare bibe , Simko got  
rabû şipya , li kaxeta nerî hinekî ponijî , nepoxek sor ji

151

bêrîka kirasê xwe yê xakî derxist , nepixand , devê nepoxê girt û bi  
bazdan berî da mal.

êvarî Simko wek xuh û bira kêfxweş ma , dema ji bav bihîst ku nêzîk  
wê radyok ji ware bê . çend rojek bûrîn nebûrîn , zilamekî du radyê  
Filîpis yabanî anîn gund. yek ji mala Hussênê Hemê re , ya din ji mala  
Simko re , gotin ku qaçaxçî wan ji Iraqê tînin . cara yekêye ku Simko

radyo wilo nêzîk dibîne . raste radyok mezin li mala Izêro muxtarê gund dîtîye , lê qet dest nedayê . tiştê xweş ku ew bixwe pêxe.

her car , dema Simko diçû kunca odê çilekiya bike bidizî radihişt radya belek , pêdixist û bi tirs destkê wê badida . çiv çiv jê dihat , li derziyê dinerî , didît çawa bi tevliva derziyê deng tê guhertin , pîr ziman û diyalêktên têngihiştî . destpêkêde stran pê xweşbûn , bi demêre zû zû bala wî çû ser deng û basan.

bêrîvanî ji bêrya vegeriyan , sîtilê şîr di destê wande , beroş li ser serê wan . qîzek ciwan wek ordekekê beroşa şîr li ser serê wê bi payebûn bûrî . xeftanê wê lê gerandî pêşanîka wê di kêleka dismala serî li ber ba dihejiya.

bi çi kara xezalaye kûçik bavê , eger ez xortbûma wek demên berê , min ew

152

bernedida , seyid Salih bi keser got xwelî sero , bine bê ti wê ji xwere nayine , ji xortekîre got.

\_ez belengazê xwedê , kengî bi min qayil dibe . berî demekê Xwazgênî hatnê , pismamê wê di devê riya wê deye . bi dilê keçkê bû , lê pismam nahêle . ev sala çaraye ku pismamê wê ketiye ber gunehê wê de , lawo bi te qayil nabe , ti doza çi dike , sed keçin din hene . wilo dengê bandana dîkekî hat . civat hêdî hêdî li ser bendera xwe da hev . Hilal ban Simko kir gotê: bazd wê radyê bîn . dema Simko vegeriya , civat li ser şerê kurdî di peyivîn.

Hilal derziya radyo li şûnekê hêdîka bir û anî , civat tev ma bédeng . ji nişkavê , yekî got : eve eve . dengêkî qeqeq ji radyo derket bi zimanê kurdî deng û bas xwend “ êrê îzgey dengî kurdistanî îraqe “ hêza xebat : îro pêşmergên qehreman girt ser leşkerin tirsok yên dijmin ew dan ber gulan . bijî kurdistan bijî serok Berzanî , Seyid

Sebrî bi germî kir qîr : bédeng bin , bédeng bin , bera em bibihîzin bê çi dibêje.

piştire bi erebî deng û bas dan . gundiya guhê xwe bêtir vekirin , bi zimanê erebî bêtir têdigên . devê wan nema çun serhev , diranê wan man qîç . nemaze dema bihîstin ku pêşmergekî kurd bi navê “Omar” tankek dijminan êsîrkir.

153

\_bijî bijî pêşmerge.

\_ev pêşmerge yanî çi kirîvê Hilal , Emînkê Rihê pirsî,

\_pêşmerge , yanî yê pêşî mergê dixwin , Mehmûdê Gulê ji dil û can bersiva pirsê da.

\_heyla agir bi malê neketî erê welle , bê çiqas pîr pîre ye , ê wek te çima kirî xwe di tiştê wilo werke , Izêro henekê xwe bi lawê Gulê kir \_civat ji kena ser piştê ket.

\_Mehmûd li ber xwe ket . ê ka hûn bêjin bê çiyê , welle lo. !

? \_sê birê Mehemûd ne ji dêkê , diberxwede kenî got : Mehemûdê Me hat malê , go Beho ka ez birçîme , min û kurê wî Sadiq gotê : wa tirşik di pencerêdeye , her bux , mejî anhaka xwar . Mehmûd bi qerpika nanekî tenûrê girt û ket ser bacane sorî perçiqî de têr xwar got : tirşika te hinekî kelêye.

waweylê waweylê Mehemûd te ava minî bacana tev xwar . îcar eger Mehemûdê me ava bacana ji tirşikê nasnake , wê ji ku bizanibe pêşmerge çiyê,

\_sêwyê bigû , bê tu ji ku zane bê çi çiyê ! Sebrî Seyid Yaqûb , qerfê xwe pêkir , dîsa civat kenî.

154

\_Hilal got : pêşmerge yanî “ canfîda “ ewê fîdawî.

\_kuro îsal çiqas zîwan dinav zadade heye, gundiyekî nezan got û tilya xwe hepişand qula bêvla xwe.

\_civatê awêr jê veda bê ku kes bersiva wî bide û guh li peyawnêr kirin.

\_rêjîma me çawa li şoreşa Berzanî dinere , yekî pirsî.

\_rêjîma me wek hemî rêjîmên ku kurdistan perçekirine bi dijminayî li şoreşê dinere û pîrr hesaba ji me dike û pilanê şofînî roj bi roj dijî gelê me li vî perçî bicî tîne . hûn dizanin berî çend meha zêdetirî sed û pêncî hezar kes kirin “ ecnebî “ angoyê “ bê gane “ di bin navê ji serxetê bixet bûne . îro roj rêjîma Sûryê pilanekî nû amede dike angoyê “ kembera Erebî “ ev pilan pêk tê li ser nerîna ku serokê mekteba polîsî siyasî nih Mihemed Teleb Hilal daniye ber çav . ev projêkt pîrr diçe li kepîtozê Cuha dijî gelê filistîn armancê Rêjîmê ji vî gavê gelê me bi darê zorê ji erdê bav û kala derxe li ser panbûna deh kîlomitra seranserî sînor li gel turkiyê û ereba tede bi war û çî bike.

xwedê me bistirîne ji van xwedê nenasan. van tiştên bi me dikin tenê Ji ber ku hîna kurdê <raqê doza mafê xwe li wir dikin , ku em li vir xwe bilivînin wê me

155

qirbikin , Mihemedê Seyid Silo got û ziq li dûr nerî û gotin berdewamkir : rehim di dilê mirovde tune , gotina bav û bapîra bi serê xweyê “ geh zêr dizane geh zor dizane “ xuyaye dinya li ser zorê hatiye avakirin , bavê Simko got û çavê wî hat hev, bîranîna ew gelekî bi paşde vegerand . kengî ereb li vandra hebûn , te erebek bi zêrekî peydanedikir , şivanê me Keyafê bixwere dipeyivî ji bo erebî ji bîrneke , îca îro roj dixwazin zimanê me li me qedexe bikin . xuyaye gur û hirçên çola ji merova mirovtirin , eger ne birçîbin hêrîş



nakin û di çarçê dehla xwede . lê têrxwarina mirova tine , tiştekek çavê wan tijenake ji axê pêve . mine bê Osmanlî ji ku hatin giyan Yemenê û Misrê . doh Elman û Firensî li vandra bûn , em li ku û ew li ku .

\_başe ev radyo derketin , em guh li bûyera dikin , berê em di guhê gêde bûn , wek kesên şikeftê , şêxê Xilfo di berxwede got.

\_birra kirîvê Hilal , ev ne sêre lo , em li ku û Birîtanya li ku , ev çilo deng ji wir tê vir , Ezo kurê Xilfo pirsî,

\_te hîn tiştekek nedîtiye tu dizane tilvizyon deng û reng bi hev re dide , ango mirov netenê bûyerê di bihîze lê dibîne.

\_waaaa bes looo ev çiyê îca , ! Ibrahîmko ecêbmayê ma.

\_mamoste Hilal heneka dike , yekî din got.

156

\_na na welle ez rast dibêjim . cîhan çend ( çiqas ) pêşkêtiye û em hîna wek meryê şikevtê di xewdene.

Simko guhê xwe baş mîkîr da van gotina, nemaze yê dawî.

çend roj bûrîn Simko û birayê xwe li oda bakur bi xar û pişkock dilîstin . dê şîr di parzinand , pak kir ji gemar û pişkula . xist beroşek mazin danî ser bapora gazê û bi çîçîkê li hev dixist . Hilal li deryê bakur xist ket hundur , Simko çû pêşiyê silav lê kir , gotê : bavê min ne li male , Hilal dest di ser serê Simko re bir gotê , ti xuha xwe nadê min yiwel , Simko got ya min çiyê , bavê min dizane . Hilal derket.

Simko û lawê metka xwe Ibrahîm lîsk berdand , çûn hewşa başûr . diya Simko got : Biro virikî , ti dîsa çîçîkê min nekuje , wê salê ez ji bêryê hatim , ez çî bibînim . zêde ji diwazde çîçîka Ibrahîm bi qahfkekî şerjêkirine û dibê : me çîçîkê kirine û Simko alî dikir . herdiwa li hev nerîn tîq tîq bi wan ket û bazdan derve.

çend rojekî , xwazgênyê xuha Simko Bedîaa hatin birayê zave û çend camêr gundî û du endamên partî . mêvana cihê xwe li ser kulava

xweşkirin . behlîv xistin ber pişt û teniştê wan . qutî ji bêrîka derxistin . bavê Simko qutî da destê

157

mêvana . tizbî di desta de girtin . Simko sifriya ser tije qedeh danî qorziya kulav , şekir bi kevçî xist qedeha , çayê dagirt û dest bi gerandinê kir . li alyê pîreka xuhên zave û pîra diya wî cihê xwe xweşkirin . mêvanekî berê xwe da bavê Simko pirsî : rewşa we û axê van roj çawaye , berî bavê Simko bersiva wî bide , pismamên wî ketin derî , silav dan civatê . wek adetê bav û kalan apanê bûkê gerek bejdariyê di xwazgênîde bikin.

civat hinekî ma bê deng . xwazgênya li hev nerîn . yekî ji mêvana li bavê Simko nerî mafê gotinê da xwe got : em mervantiya we dixwazin , destê keça te ji heval Hilalre dixwazin , em li ber wene , em di wê hêvyêdene ku emê bikaribin dozê we bi cîbînin.

bavê Simko li pismamê xwe nerî got : birastî keçka me hîn ne ya mêraye , lê ji ber Hilal xortekî nesêleye , neştiman perwere tiştê xwedê kiriye wê bibe û nerîna wî ket a pismama . wan jî razîbûna xwe dan zanîn bê ku ji aliyê pîreka bi pirsin qelen hate birîn sê hezar û xelata xalê , piştî ku yek hezar da qedrê mêvana bavê bûkê got : em barê we giran nakin , ser sindoq tine , devê derî tine , xelata birê ne gereke , ji ber em rewşa zavê baş dizanin.

\_ti camêre , yekî ji mêvana got.

158

bûkê hayê wê ji bayê felekê tunebû , tentenê xwe çêdikir , dema jêre gotin ti dan rebenê got : waweylê ez dam kê pepûkê , ! pîreka lîland , şirûb gerandin.

demek ne dirêj di wê navê de bûrî , berbû hatin , bûka çarde salî hazirkirin , ebe lê kirin , şerpe avêtin ser çav , bi dest girtin ji deryê

bakur derxistin Xensê Lîland û got : bûkê derxin ji deryê çiya bibin ji mesûlê partya bûk baş xemilandî ew bi du turimpêl li dora gund gerandin , berê wê dan mala zavê bareşî gund . qîza bi stran dan dû bûkê:

bûkê delalê rabe xwe karke

zave ciwane xortekî pake

piştire stranê neştiman perwerî gotin:

herne pêş herne pêş

dewr û demya me ye

welat çav li rê

bendewarê meye

eger xort neyên

vane keç em meşin

bese koletî ser firaz em bijin.

dema nêzîkayî li mala zavê kirin , xorta li serê bên , tavêtin ser zave digotin:

xweş pêşketî

xweş pêşketî

miletê Kurdî pêşketî

kesek nemaye raketî

159

ji xeynî van kalê ketî

bavê Simko , du kar şerjêkirin xwarna gundiya çêkir.

sal zîvirî salê , buharê careke din barkir , rojên havîna germ roj sipartin rojê , li hawîrdor dinav pirêzade , keryên pez ravedida , di riyên tijî tirapêlk de şopên mara pirr dihatin dîtin . barûdê qut ji ber zaroka ji komek pûş difirîn koma din . avgîr hêdî hêdî dimiçiqîn tengayî li beq û tilûrên çolên dikirin ava bîrên nava gund kêmket

. rew rewka wek rastiyeke xwe berçavdikirn . sibakê bi bêriyave , hîna Simko serê pez li ber siya dîwêr ji dêre digirt , Hilal hat ban Simko kir , jê karek xwest gotê Ji kesîre nebêj . Simko piskilêt derxist , bê ku bersiva dê bide , berî da gundê Girdêwan riya ax tev tirapêlk girt , avgîr derbaskir , li dilê xwede xwe dît mezin , qîrkir strana , berî gundê Kûtê bibûrîne marekî sorî mezin xwe li pêşiyê Xist , tevzînok bi laşê Wîde hatin , lê piskilêt xurtkir li pişt xwe nerî tiştekan nedît , tirsê Ew berda , dema gihişt xeber da hevalê Bi navê Mihemedê Elî û li ber siwar hat , hatin Qoşanê Gerek xeberê Li wir bide hevalê Barûdo.

êvarî bi wî rengî çû Elî Fero dû Mihemedê Hesênê Mistê . li paş wî siwar

160

hat berî dan Girsor , taryê xwe berda erdê , şevê bê heyv . kêstek û lemên bistana li ber çavê wî dibûn hov û pîrebok , çîrokê li ser cina û pîreboka dihatin bîrê , di dilê xwede digot başe ku ev heval li mal hat dîtîn , eger ne wilo ba wê çawa bi tena xwe wê şevê di vê tariyêde li hêrikê Elî Fero xe , nexasim çiqas bihîstên li ser pîreboka hatin guh . piştî xwe ji bîr kir , zarokê hevalê wî hatin bîrê , xwest ku di wirde bi wanre bi yabo yadê xezalê bilîze , lê xwe dît ne weke wan ji ber tiştê ku ew dike yek ji hevalê wî nake . nişkêve veciniqî dema çûkek ji kêleka rê firî.

demê nêzîkayî li ser sala nû dikir , serme roj bi roj xurtir dibû , rojê bê deng tirimpêlek polîsa hat hewşa oda Girsor , zû gundiya bihîst ku du girtî bi wanrene . Simko wek her gundiyeke berê xwe da odê , li qorziya hewşa xwe dît sê leşker dikin pistpist , bê deng rawestiya û guh miçkir , deng hatê , yekî ji wan ji yê din di pirsî : \_ girtiyê me çi kesin,

\_kurdin.

\_çikirine,

\_partîne.

Simko baş tê ghişt ku di diyalêkta polîsde kîn û nehiskirin heye , naskir ku ji ber ew ne kurdin ji şûnin din hatine serdestiyê li

161

wan dikin . hîn wilo , Simko dît polîsekî tiving xistiye pişt Restemê mele şamo , bi dûde berî dan başûrî gund . îca ev çiyê , Simko ji xwe pirsî . berî ku bersiva pirsê xwe bide , çavê wî ket qapûtê Restem , naskir ku qapûtê Hilale , ji ber Restem çend roj li pêş bibû mêvan li mala wan , dema bi şev xatir xwest qapût lê kirin ji ber serma xurt . berî ku ramanên din bînin dît leşker rawestiya û Restem gavekê li pêş wî li ser kaboka av “ rijand “ . bê çî zalim û bêbavin nahêlin rebeno derkeve derve , gundiyeke bi dengê nizim ji xwe got . piştê polîs herdû girtî Restem û Biro xistin cêbê û berê xwe dan Amûdê.

\_ev erda bê namûs ne çiyak , ne şikevtek em dinav destê wan de dibin wek mirîşkên di nav lepên rovyandê , Sebrî got.

\_xwelî li serê wîbe , bera dehkek bida leşker û bireviya , mane yek bi yekî bû .jinka cînara ku hevîrtirş dixwest , xwe avêt nav gotinê.

\_sêwiya bi gû , kes ji te pêve bîra vê gotinê nabe , ne wilo. !

\_wa weylê Yabo , ma min çî gotiye jinik li ber xwe ket , rahişt hevîrtirşê xwe û xwest derkeve , lê gotina Sebrî ew ragirt , bi ken gotê:

162

\_xwarzê , dilê xwe megre . ma ku kulm lê da , ti ji minre nabêjê ,wê pepûko bi kude bazda , ne çiyak , ne şikevtek , ne newalek û bi serdejî cêba wan li ber deryê odê rawestyaye . ma dikarîbû bireve xwarzê , em baskokirîne.

\_gotinê te bi serê xwene xalo , aqlê min wilo got û derket.

\_qapûtê Hilal li ber Restem bû kuro , ye go van roja li ber kurê me bû . bavê Simko bi beşîşandin got.

\_kurkê me negrin îca , jinê bi tirs diber xwede got.

\_tîq tîq bi Sebrî ket , ma qapûtê we çima kirî li ber wîbe,

\_mane berî çend rojekî , ew û çend hevalê xwe bûn mêvanê me . berê sibê hinek ji wan çûn , sermak xurt ziwa dihat . me qapût dayê , ma kê bîra wilo dibir.

\_de bes lê , mêr lê vegerand , di mala mede civîna pêk tînin , em “ revyaya “ xwedî dikin , ti li qapût maye heyirî.

\_ma ez ji kuza!

roja din hat bihîstin ku Restemê Mele şe’emo ji parastin-xanê revyaye . wê rojê Bixwe berf bi qefla dihat xwarê û digya kaboka . reva wî bû çîroka civata . her yekî bi renekî digot . xwedya hevîr tirs bixwe digot : nikarîbû ji destê yek neferî di gunde

163

bireve , ma çilo ji bajêr û ji nav koma wan revî,

\_di be ku nobedar xew kiribû , jinikek din ji xwere got.

\_kî ji ku zane , dibe wan ew bi bazdan dabe , kalekî diran ketî diber xwede got û bi qirşikekî xêzik li ser axê çêdikir.

lê hevalê partî bi renekî din di peyivîn , digotin : dema Restem birin pirsdanê , di salonê de ew tenê hiştin , herdû endamên parastinê derbasî odê bûn kirin qire mir , di wirde revî.

tinabê , dema herdûk ketin qirka hev , Restem xwe dît tenê , nerîna wî ket deryê vekirî , dît çawa berf bi qefla tê xwarê.

hêdîka hat devê derî , destê rastê avêt kêleka derî , serê xwe dirêjkir derve , bi zanibe çî heye , tirsê û sermê hestiyê wî zeftkiribû , nigê wî şemitî xwe dît li derveyî salonê . bi tirs li dora xwe nerî kesek

nedît . nerîna wî ket erda rast xemilandî ji berfê . di wê çarîkê de biryara revê da . destpêkêde çend gavên fireh avêtin û bi lez li pişt xwe dinerî û ji nişkêve bi bazdan berî da aliyê serayê , di ber zindanêre xwe berda , nobedar lê teqand , lê Restem wek babîsokê winda bû.

bê ku bizanibe derbasî mala camêrekî fileh binavê Binyamîn dibe , lê bi xwedî derdikevin û pîrek û zarokê wan , li derve

164

bi gulokê Berfê dilîzin , şopa niga ji ser riwê berfê winda dikin . li ber sobê Xwe germ dike , parîk nan dixwe û radizê.

êvarî malikê cilê Jina li ber Restem dikin , jê dixwazin cih biguhere . xwe dighîne mala Cemîlê dirrê , bi alîkariya Mihemedê Xelef bajêr bi şev berdidin , dirin mala şelaşê Xalib li Keçel Ereb , piştî Restem dire Hermê Hesen , Xirbê Ortê û Gerşê.

\_bi xwedê çîrok tevde nakeve serê min , ?nêsê Xişo got û bû irt irta wî.

\_ma hevalê wî Biro çima ne reviya , yekî ji civatê got.

\_kuro em xwe pirr biçûk dikin , eger Restem ne kurd ba , vîtnamîba yan bolîvîba menê bawer bikra .çima em nebawerin bi karîbûna gelê xwe ! xortekî bîrwer ji wanre bi diyalektekî sert got.

\_kuro girtina wan bixwe bê qûnîbû , hayê gumrikê Ji wan tinebû , dil wande mamostê dibistanêne , dema dîtin ketin hev, şelişîn û bi rev rê berdan û tiştin veşartin , li wan gerîn , kaxit bi wanre dîtin , ew girtin û dan destê organê parastinê.

\_bavê Restem bixwe jêhatîbû , qorzîk gazê dida gundiya digot qoçanin.

\_mele şa'amo pêhlewanbû , bi mele Elî û Cegerxwînre ramanên netewî didan millet.

165

nîvê şevê Simko li ser dengê piyayên parastinê şiyarbû . cêb li ber deryê mala Hilal rawestiya , Simko wê şevê li mala xuha xwe Bedîaa ( pîreka Hilal ) xew kiribû . xuhê derî vekir , bi kurdî li wan vegerand : Hilal ne li male . çavê wan ketin demaçê ber newqê wan . dema endamê paristinê dest bi girtina birayê Hilal Faris û Selîmê Hacî Hesso kirin , Bedîaa xwe ji wan vedizî , sikaka teng li xwe bada bilez berî da mala Ehmedê Hemê bakurî mala wan.

tinabê Hilal û Seîdê Barûdo katjimêr yekê şevê ji gundê Qoşanê hatine , tev cilê xwe dirêjkirine meroz dihat serma berê Sibê derbasî hestiyê laş dibû , Bedîaa bi herdû desta û xurt li derî da.

dem rojiye , kevaniyê karê sihorê dikir , xwarin berda hat ber derî bi dengekî nizim pirsî:

\_kiye,

\_vek vek , kirîva şikro ezim.

\_kirîva Bedîaa rebenê ti bi dû mêrikde hatiye!

\_na keçê cêba parastinê li Hilal digere.

Hilal çengbû çi heye , hîn wilo şewqa cêbê ket xaniyê Ehmed.

yek çû pişt xanî , yê din ketin hundur . Seîd di pencerêde bi dest girtin . Hilal

166

bixwe rizgarbû û jibo şopa berfê bidû xwede nehêle , ji hewşekê xwe davêje ya din , dighê bareşî gund û berî dide başûrî gund mala Mihemedê Etto û çîrokê Jêre dibêje û jê dixwaze teneka sihorê Ji destê mele Cemîl bigre û xwe berde nava gund bizanibe çi heye.

di mala Ehmed de endamê parastinê pirsî:

\_kanî Hilal,

\_em ji ku dizanin , xwedî bersiv da.



\_ev kiye , destê xwe bi alî Barûdo de vekir.

\_ev birê mine şikro got.

\_birê te çima dixwaze bireve,

\_dema cêb dît tirsya.

\_navê te çiyê “ ûlak. “

\_Seîde.

\_ha tu Seîdê Barûdoye . bi şerefa min ev jî pîreka Hilale , wê xeber daye û Hilal di vê pencerêre reviyaye.

endamê “ paristinê “ derketin , Ehmed ji nav ciya kişkişandin bê ku dengê şikro bibin xwe , ku mêrê wê nexweşe.

yê mayî bihev kenyan , kê çawa û bi çi rengî bersiva paristinê bi zimanê Erebi da , bi tîq tîq çûn li Hilal bigerin , pêrgî lawê Etto bûn

.

li gundê Gerşê Restem ji hedê partîre li ser reva xwe wisa got . dema malka fileh

167

çîroka min bihîstin , jînik û zarwê xwe derketin devê derî bi berfê lîstin , şopa min wînda kirin , êvarî cilê pîreka li min kirin û ez derketim.

-kuro wek dibêjin bi derewa we xwe da girtin . dibêjin hayê gumrikê Ji we tinebû , ew diçûn Girsor hineka di tûtina Tirkiyê Hacî Mehmûd de hildabû . wan digot qey hûn mamostê dibistanêne . nîza çima we bazda,

-wilo çêbû , nêzîkayî li me kirin , em şelişîn . me nema dizanîbû emê çibikin , ji ber wan dokûmêntê bi mere.

-îca ka tê çibike,

-heval dizanin . mine bê heval çi rayê jêre dibînin.

şeva din hevala restem giyandin gundê Imbara , siba roja neha katjimêr çar Cemhoro bi tirimpêla xwe ya “ opil “ berê wî da Qamişlo, dema li ser pira ceqceq di bajêrde polîs dîtîn , tirsê Ew girtin , şelişîn , tirimpêl li kêleka rê ket lê bûrîn bê kes wan birawestîne . li qudûr beg li mala şêx qelebalix mele Mihemedê Neyo yek ji birêvebirên partî , ket odê şîpya bê ku rûnê got restem : ti bixwe her miriye , hima ji van dera bazde , her çayê kurdistanê , dema neyo wilo got û derket , ava germ bi laşê wîde hat û ket xema , madê wî bû wek

168

jehrê , di hundirê xwede pir tûrebû , rabû serxwe kêleka xwe da pencerê , li hewşê nerî dît çawa peqilkê baranê vedibin û vedimrin , diwirde bîr li jiyana û mirinê kir . çixarek bi çixatê pêxist hinekî pûnijî biryar ji xwere stand , wê şevê berê xwe bide Efrîn an Kurdaxê baskê didwa yê kurdistana piçûk . li bozînga mala bînbaş siwarbû xortê şifêr beşîşî gotê : navê min Ibrahîm Ese’de xelkê Hesên Kêfim , xema nexwe ezê te sax saxlem bi gînim çî , xwedê bê erê.

rojî ket dawya xwe , şeva dawî bû ku mele bi teneka xwe gundî rakirin sihorê . Simko xwarna sihorê bê madê xwe xwar , ji ber wê êvarê wî û xuha xwe Bedî’a komek mişkên mirî dîtibûn hineka avêtbûn çala tara jor . dilê wî ji wan li hevket û di dilê xwede got : ev kî hov ev mişk avêtine çala nava gund.

roja didwa ji cejnê Li piştta xirbê gund , kêleka gir , zarok bûn du bendî , bi berfê pevketin , mamostê dibistanê ji wanre bû kemandîr . zaroka ji dil û can gulok tavêtin hev wek cengek rast.

paş demekê berf hiliya giyayê nû serê xwe derxist . jiyana nûjenbû . gêrika dest bi avakirina bajarên nû kirin . zarok bi kêf û eşq diçûn dibistanê . rojên buhara rengîn,

169

kulîlkên kesk û sor û zer , çûkên renga reng . dema zaroka cêba gumrikê ji dûrve naskirin , bihevre kirin qîr : gur hat , gur çû , gur hat , gur çû , gur hat , gur çû . bi dengê wanre koma zilamê serê xirbe li hevketin , dest bi rijandina qutyê tûtînê kirin . dema gumrikê nêzîkayî li bavê Simko kirin , bi niga tûtîn di nav axê da . şemsoyê gumrikvan gotê:

-tûtina qaçax bi terebû,

-tûtina çî , eger te tûtîn bi minre dît , tu dikare wilo bêje.

-naxwa te çî rijand , şemso pirsî.

-ma te çî jimine.

şemso lê nerî û berî da cêbê û bi qehr got : dibe rojekê ez te bigrim

.

-nizanim ti çî ji vê xelkê dixwaze ti dibê qey ji te pêve gumrikçî tinene , dengê Mihemed çû şemso , bi dû xwede lê nerî û berî da xirbe.

-siktir bib yaya newek xwe , xwe kiriye tajî , Mihemed bi dengekî ne bilind got.

dema şemso berê xwe da koma civatê li ser xirbe , Mehmûdê Gulê dikr û nedikir qutya wî venedibû , rabû serxwe , berê xwe da bîra jor û şemso da dû , wek tajiyê bera keroşkekê de . Mehmûd qutî bi wê lezê avêt bîrê.

170

Roja din Simko û bavo li serê zada devê newalê , pez diçêrandin , dîtîn cêbekê berî da wan , bavo dîsa xwest tûtînê birijîne , lê dema bala xwe baş dayê , naskir ne gumrike . cêb rawestiya , dido jê peyabûn û pirsîn:

-kanî qoçanê te,

-qoçanê çi ! bavo xwe li ber nexist.

-qoçanê pez.

-qoçan ne bimorene , li malin.

-ha li malin , ma ne gerek bi terebin.

kesî ev jimere negotiye , piştire ma tu mektebê min hene , Mihemed beşîşî lê dil bi tirsbû , qoçanê wî hîç tunebûn û di ser sed serî pez li cembû , hinekî ponijî û got : ev pez ne yê min tenêye , yê gelek malaye . mamûr lê nerî gotê : emê pez bi navê te deynin , îşê me bi kesî neketiye.

Hinek pere xist bêrîka mamûr û got : yê min deh pezin , mamûr qoçanek bi navê wî danî tenê deh serî pez têde danîn , cêba wan çû.

Ev segbavana dev ji me bernadin , roj tine ku hinek ji wan nayên , ya gumrike , ya qoçançîye , ya parastine , ya bavê “ mirîşkane “ em nema ji ber wan dikan der.

-îca bavê mirîşka ! Simko got û bû tîq tîqê wî.

171

demek bûrî , dem payize , rojekê zilamê gund , danê êvarî , li ber siya mizgevtê rûniştîne . refek qitik ne serî heye ne binî di ser wanre derbasbûn . sebrî li wan nerî got:

-xwezka ev tev balefirbana û dibin raya mindebana û tiliyê xwe di ser simbêlare bir û anî.

Ibrahîmkê Hemo lê nerî gotê : heger wiloba tê çibkra ji wan.

Sebrî rabû serxwe , kumê xwe bi alîkî kir û teqil da xwe got:

-heger ev balafirê minbana minê ha wilo lêxista , Sebrî destê rastê bi bareşve kir û zîvirand bakur yanî te kes ne dihişt , Ibrahîmko pirsî

.

-na bi meznaya xwedê , ne ereb , ne turk , ne faris minê tev qirkiribana , bê çawa ew me bisedê sala qirdikin , min ji kurda pêve kes bernedida.

civat kenî Sebrî çixare xist nav tiliya . ev jêre tê gotin şofînîzim û regezperestî , Hilal gotê , bo vê yekê gerek tu bê berbendkirin “mehkemekirin “ û di wirde Hilal komîtek sazkir û xwe kir mehdawî û dest bi pirsar kir:

-navê te , temenê te , karê te,

-Sebriyê Seyid yaqûb , xelkê bêcirman , 42 sal , cotkar.

172

-çima tu dixwaze vaqas mileta tunebike , tu nizane ev karekî şofîniye antî mirovantiye,

-ez dixwazim wan tunebikim , ji ber wan jî bi sedê Sala me tune dikin . eger ez şofînîbim wek kurdekî , sûcê wane , ji çaxê çavê me vebûye ta îro roj çewsandin , bindestî , qirkirin , zilm û zora wan hiştiye em bi vî rengî bîrbikin.

-lê kurda li gel ku pir caran serkêşê naweçebûn , şaşiyê wisa hîç nekirine . her bi mirovantî bi hemû gelare didin û distînin.

-lê ew çima bi mirovatî bi mere nakin . çi gunhê kal û jin û zarwê kurd hene hema ku roj tine bi deha nayên kuştin , tenê ji ber doza mafê xwe dikin.

endamê komîte kirin piste pist , bi hev şewirîn û Hilalê Botî biryara mehkemê xwend:

piştî şewr û mişewra komîta me welatî Sebriyê Seyid yaqûb gunehbar dike ji ber nerînên wîyên regezperistî û dîtinên wî yên nazî dijî gelê Faris , turk , ereb , ji ber ev milletana nabin berpirsiyarê gunhê rijîmên xweyî serdest û ji ber gelê kurd her dem xêr û wekhevî xwestiye . komîta me

173

binava gelê kurdistanê bi heqê Sebrîyê Seiyd yaqûb diya wî neyo  
biryara darvekirinê Sitand . karê mehkemê kotayê pêhat.

civatê destê Sebrî girêdan , Helîmê Evdîko bazda werîs anî , yê din  
teneke danî , werîs dalqandin , tenê ma ku nigê xwe li tenekê xin .  
di wirde tîq tîq bi Sebrî ket got:

-kuro qey bira hûnê min bi darvekin . dijmin bi tank û top û  
balafiran bi rastî kurdistan wêrandikin û gelê me di perçiqîne , min  
du gotinê boş gotin : xweska ev qitkana bibana balafir . ne qitik  
dibin balafir û ne min tu kes qirkiriye . civat kenîya serê wî ji werîs  
derxistin , benê destê wî vekirin , gotinê vê carê em di tede bihirîn

roja din , di eynî katde , dîsa civat li wir hat hev , guh êzgeha dengê  
kurdistanê dikirin . serkevtinê pêşmerga dîsa hişt hêz bîn Sebrî ,  
germbû û got:

-kuro ez jiwere dibêjim kurd wê nawçe vekin wê dijmin bi  
perçiqînin, bijî gelê kurd , bijî berzanî.

-berê eee ev xeta kurdistanêye , ?nisê Xişo xêzkek li axê xist û bû  
irt irta wî.

174

-sêwyê bigû , ne ti ji xwe fedînake , ne gazin ji te nabin , yê ku kirasê  
Jina xwe li xweke.

-wer sibe ez û ti emê bigrin ser qijla qamişlo ?nis got.

-yê ku neyê ne tiştêk be , Sebrî lê vegerand.

siba roja din ?nis qayiş da pişta xweyî zirav , kirasê xwe xist ber noqa  
xwe , rahişt cinehekî û berê xwe da Sebrî , gihişt deryê derve û  
bankir.

-Sebrî Sebrî

-Kiye,

-Ezim , rabe em herin.

-Ku,

-Bigrin ser qijlê.

Tîq tîq bi Sebrî ket ha .... ha ..... ha .... , wer wer derbasb , çayikê vexwe . rûniştin bi hev şabûn , kuro ma birra tê bigre ser qijlê . di wirde qîr bi gund ket . gotin ku jina Letîfê Gelo çû ber dilovaniya xwedê “çû rehmetê. “

Gundî tevde , li rojhilatî gund li devê deryê malikê hatin hev . piştî şuştin û amedekirinê , laşê wê derxustin , berî dan mezelê serê gir , herdûk qîzên wê Nofa û Siltanê Ji devê derî , heta serê gir , didan ber hev tavêtin ser diya xwe ya hîna ciwan . sîngên xwe yê hîn mên nedîtî , dan ber

175

kulma, por bi serê xweve nehiştin . terim xatir ji gund xwest , careka din nema vedigere vir , jiyana xweşkok û şêrîn piştî xwe dayê.

Simko jî wek zarokê hevalê xwe dabû kêleka komê , cara yekêye dibîne çawa mirovekî bin ax dikin ango vedşêrin.

-yadê , ev çilo yek di tîrbêde dikare bimîne , bêhna wan çawa tê der , Simko pirsî.

hêsrê dê bi ser rûkê wêde hatin xwarê , mirna qîzikê wê “ zekokê “ û “ Rebîaa “ hate bîrê got:

-mirî bixwe nahisin kurê min . yê mir , çû nema vedigere ! doh min ew dît keçê , sipî saxbû , diber halê xwede mir , ji bê kesî , feqîrtî û nezanî . eger textor hebûna , erê mirin bi destê xwedêye , lê hema ez dibê wê rehet biba.

-erê xwako , belengazê Tenekak xwîn jê çû Gulê got.

-qey roja wê hatibû Hesîna got : ma nayê bîra we Ehmedê Rihê mir , tirba wî kolan , ew dişûştin û dibin avêde şiyar bû , heger wê bîskê raneba , wê lawik bi saxî veşartana.

-her yek li bende roja xweye . cînara wanî Sibho vegerand.

176

Simko bi xwe bîr li mirinêde fikir di dilê xwede di pirsî : mirin çiyê , û çima heye , çilo mirî dibin axêde dimînin ,! bikude dirin , zarokê xwe çima tenê dihêlin , lê nikarîbû ti bersiva ji pirsê xwere bibîne. hinekî ponijî hat bîra wî çawa bavo “ mihîn “ di çalêde bin ax kir . hat bîra wî ew çûkê stiranvan li ser textê hesin li serê ban , çawa bi kevîrê wîre hate kuştin bê ku stirana xwe bigihîne serî . yanî mirin ji her tiştêre heye . heta ew kulîka ciwan dema jêbû hate ziwakirin . Simko ji xwere digot:

hê hê Simko di dilê xwede got û ziq li pûnktekê nerî di cihdejî xwe ji bîrkir , dema dengê Balefirê hatê , her tişt berda û bazda derve. zivistana giran barkir , gundiya sobe hilanîn , bîrê nava gund têt avbûn . erdê tîrêjê rokê himbêzdir . li çol û newala evîndara lawekê xwe digotin , ango tavêtin ser lawikê xwe buharê jiyan nûjenkir

şevêkê Ji wan şevên buharê yên ciwan , Ismetê Hesenê Ji gundê şidî Silta qîza Letîfo revand her yekî li gor mêjiyê xwe li meselê di nerî . pîrekên navser digotin wê porkurê bawer nedikir diya wê bimre , hîna gora dê ziwa nebûye.

177

xortê germ xwedî xûşk zirtê paçikî dikirin . yekî ji wan digot : eger xuha miba minê herdûk şerjêkiribana.

lê gundiya bi piraniya xwe digotin qenckir , wê ji xwere bistire , lê gerek berî xuha xwe ya mezin mêt nekirba . lê yê ji tevda bêtir xwe



li erdê xist Mehmûd Paşa bû , çavê şîn di nava serîde dilîst , boqê Simbêlê zer , kolozê wî hatibû neqîşandin ji perîkên her reng . bi dengê bilind bi xwere pevdîçinî di got:

-nema qîma min tê , ez ji serxetê ji bo çî hatime vandra , ka ji mire bêjin . ez Mehmûd Paşame , paşê qîz û xortame . hîç qîma min nayê , kes bê min kesî bixwaze , bîne , biguhêze yanî jî birevîne , divê bi min bi şêwirin.

tîq tîq bi pîreka ket , kwîra Xezê xwest bêtir wî tevvide gotê:

-xalê Mehmûd mane nema kes guh li te dike berî çendakî lawê şêxmûsko qîza Hemê revand . doh lawê Hesenkê eva din revand , wê rojê di malka berdêlî dan hev û herweha û Xezê bi destê rastê çarika xwe da ber devê xwe , di bin simbêlare kenî.

-ezê çavê wan derxim , ka bê kîjan kûçik ji îro pêve bi min naşêwire , em binerin ez paşê qîz û xortame

178

yan na ! . paşa kolozê xwe asêkir û li zaroka nerî ferman da:

-leşkerê min bibin rêz . zaroka du rêz çêkirin . paşa dest da paş qûna xwe çû û hat got:

-amadebin.

-dest ji ber xwe berdîn.

-marş - herin pêş , yek dû , yek dû , yek dû . paşde vegerin . belabibin.

zaroka kirin qîr : Mehmûd Paşa , Mehmûd Paşa . bi dengê Wanre kûçikek reya , li ser bendera kerekî bi sing kutayî ziriya . dîkekî ji ser sergo banda , bû qîd qîda mirîşka . Mehmûd Paşa simbêl berjorde badan.

buharê rojê xwe qedandin , çolê bi demêre xeml ji xwe avêt , germê roj bi roj zewrê xwe şidandin , teyr û tilûr û heywanetê çolê navkut

di kirin ji tîna . ava bîra roj bi roj dadiket . têrabêlk digiya gwîzeka .  
marin têr jehr roj bi roj hartir dibûn . çikçikan û têtî û beraşe û  
silêmanê dunikil bênder dixemilandin bi hebûna xwe . zaroka sibê  
ta êvarî xefk vedidan li ber çûka , kurmikê zerik ji nav axê derdixistin  
dixistin xefka , çikçikan hîç li xefkê nedixist , xwe bi deha cara bera  
ser kurm dida bê ku lêxe , wek bi zanibe xefke

179

.Simko çiqasî dixwest çikçikan li xefkêxe lê nediketê.  
wê havîna têr ax û germ Mehmûd Paşa zarok didan dû xwe diket  
pêşiya berbiwa . dora nîroye dema tirimpêlê bûkê ji riya Girdêwan  
nêzîkayî li gund kirin . Mehmûd Paşa da pêşiya leşkerê xwe , ji aliyê  
gir xwe berda kêleka rê , çepik û lîlandin û stran û toz . hibriyên  
renga reng di camê teksiya ber ba dibûn . dema tirimpêla bûkê  
ket ber derbêde , Mehmûd paşa ferman da : lêxin lêxin û kevir avêt  
teksiye . pêre bi deha kevir wek gula hatin teksiya . şifêr bê çare  
man , rawestiyan.

-hûn çi dixwazin ,ev çi dihnêtiye , hûnê tirimpêla bişkînin , xwe  
bidin alî , rê vekin.

-livandin tine , hûn bilivin hûnê bên perçiqandin . Mehmûd paşa bi  
zirt bersiva wan da , em karê xorta dixwazin.

-kanîn xort , ev sêwlek te ji mire kirine xort , dema wilo got zarwa  
teksî dan ber kevira.

yek ji mervê zavê peyabû , bi zimanekî xweş axivî : paşa em hêvî  
dikin ti riya me veke , em berbûne û ti heqê Te li xwediyê teksiya  
tine , ji ber ku bi kirya xwe hatine , kirya wan pazdeh wereqene ,  
eger ti

180

camekê bişkîne deh qat wê lê bidin . ti paşeye , yên wek te mezin fireh li mesela dinerin . piştire ev daweta yek ji kadirin partyêye.

dema Mehmûd paşa ev gotin bihîst , boqê Simbêlê zer bi jorde bada , koloz rastkir , destê rastê dirêjkir û bi aliyê zarokade hilda û ferman da : paşkevin , rê vekin , paşkevin , dîsa destê xwe rastkir û hêdîka bi pêşde bir , kolozê têr perîk ji berbiware hejand , bû teq teqê demaçâ û lîlandina qîza û bi çepkare stran:

xweş pêşketî xweş pêşketî

miletê kurdî pêşketî

kesek nemaye raketî

ji xeynî van kalê ketî

qîzekê da qîr:

eger xort neyin , vane keç em meşîn.

bese koletî , ser firaz em bijîn.

zarok dinav icaca tirîmpêla de windabûn. dengê qîzek din hat distra:

şam û heleb , diyarbekir

kekê mino zava

me hazirya bedlê te kir

kekê mino zava.

teksî hêdî hêdî ji ber çav ketin , zaroka xwe bera nav zada dan , şoqil dan hev , rext ji kulîlkên zer çêkirin . li hêlînê xwe nerîn , qazî mazî digrtin , bi dû çûka diketin,

181

qehfikê rengîn didan hev . îşê zaroktî , her tişt xwe li wan dixwe , her tişt xweşe.

roja roj ajotin , derase hatin gund . Simko û hevalê xwe pûşê gundiya bi pera dan hev . teneke bi dû derasêde vekirin û bi bazdan bi sêgulîka kom ji ser didan alî . piştire çewal avêtin dû û li ser qûna

derasê rûniştin , dema çewal tije pûşdibû , werîs ji herdû aliyave  
sisdikirin , koma pûş dihat xwarê.

raste sîpe carna di tirsiyan , lê çaktirbû ji bazdana bi dû derasêde.  
şevder man , Simko li ser çewalê genim xew kir . bi beyaniêve şivanê  
Kevrê Sipî nêzîkî li wan kir , pezê wî ra veda di nav pirêzêde , singê  
ker kuta.

-hûn ne tîne , şivan pirsî û meterê avê ji kurtan vekir piştire pirsî:

-hûn vê siba zû çî livir dikin,

-me şevê din livir xew kir.

-çima , qey hûn li ber zadin,

-na em pûş bi dû derasêde didin hev , Sedîqê Gulê bersiv da.

şivan buxçik ji xurcika ser kerê derxist , danî ser çewalê genim , vekir  
, fermo taştê bixwin . Sedîq dest bi lez avêt xwarinê bîst û yek hêkê  
kelandî xwar . Simko yek tenê , şivan kir nekir , nekir dido.

182

rojê Serê xwe derxist , hêdî hêdî xwe hilda , tîrêjê xwe berda  
hawîrdor , germî da can , şivan erebkî xwe avêt ser kerê pez bi  
başûrde kişand . Simko û hevalê xwe Sedîq berî dan gund . û hestak  
bi dest girtin bû teq teqê wan bo xarê kevirî çêbikin . keleha  
mêrdînê xweş dihate dîtin.

havîn ber bi dawîve çû , gêrevanya gêre kiribûn , pirêze tije xaçerêk  
û şopên pez , bişkul û şûna sima . gundiya karê ajotina erda dikirin  
. dîk û mirîşk li ser sergwa nikil li erdê didan . bê dengiyê Bi ser  
gunde girt.

Simko li ser dika hewşa bakur li dûr dinerî , nerînê wî li keleha  
mêrdînê rawestiyan . ramanên wî dûr çûn , pir kêf xweş bû , beyanî  
wê here bajarê Qamişlo . bajar wê wî himbêz bike wek qutabîkî nuh  
sinfê şeşa . demek nû wê dest pêbike , jiyana nûjen bibe jêre . lê dîsa

dil bikul dima , dema bîrdikir ku wê mal û hevala bi çî bihêle . lê xwe bi xwe razîdikir di got:

- ezê vegerim gund , ji demê ta demê , havîngehê ez dîsakê Livir bibûrînim . qûnaxeke taze ji Simko re dest pêkird .

\*\*

## DERGÛŞ

Laleş Qaso

4

5

Weşanên Pelda

@ Pergala bergê û rûpelan: Pelda

Wêneyê bergê: Siyabend

Çap: Pelda

Stockholm 2007-07

ISBN: 91-974150-4-9

6

7

Beş yek

Werdek .....11

Qaz .....12

Kew .....13

Çêlkêw .....14

Darkutok .....15

Reşêle .....16

Çivîk .....17

Zinzinîk .....18

Mirîşk .....19

Çîçik .....	20
Elok .....	21
Dîk.....	22
Bilbil .....	23
Pepûk.....	24
Şalûr .....	25
Legleg .....	26
Teyr .....	27
Turlî .....	28
Kund .....	29
Kevok .....	30
Başoke .....	31
Têtî .....	32
Xazik .....	33
Tiltivîk .....	34
Qirag .....	35
Zelore .....	36
Silêmanê dunikil .....	37
Ev dizên .....	38
Ev kurk dikevin .....	39
Mîh .....	40
Beran .....	41
Bizin .....	42
Nêrî .....	43
Xezal .....	44
Beraz .....	45
Kar û berx .....	46
Pezkovî .....	47

Kûçik .....	48
Tajî .....	49
Toltajî .....	50
Cewrik .....	51
Keroşk .....	52
Xirneq .....	53
Pisîk .....	54
Ga .....	55
Gamêş .....	56
Boxe .....	57
Çêlek .....	58
Gergedan .....	59
Golik .....	60
Hêştir .....	61
Fîl .....	62
Qedene .....	63
Qantir .....	64
Bergîl .....	65
Ciwanîk .....	66
Hesp .....	67
Ker .....	68
Dahşik .....	69
Naverok	
8	
Meymûn .....	70
Hirç .....	71
Wawîk .....	72
Keftar .....	73

Gur .....	74
Piling .....	75
Rovî .....	76
Şêr .....	77
Sîxur .....	78
Mişk .....	79
Xilt .....	80
Jojî .....	81
Sihor .....	82
Kûsî .....	83
Kevjal .....	84
Dûvpişk .....	85
Gumgumok .....	86
Beq .....	87
Masî.....	88
Tîmseh .....	89
Mar .....	90
Moz .....	91
Mêşa hingiv .....	92
Perperîk .....	93
Kulî .....	94
Qumbil .....	95
Mîro.....	96
Pilopilo .....	97
Xalxalok .....	98
Kurm .....	99
Qazîmazî .....	100
Sersal .....	101



Şeva reş .....	102
Gavan .....	103
Şivan .....	104
Bêrîvan .....	105
Koçer .....	106
Bavo .....	107
Kalo .....	108
Pîrê .....	109
Apo .....	110
Xalo .....	111
Zarok .....	112
Nanpêj .....	113
Daholvan .....	114
Zirnevan .....	115
Bilûrvan .....	116
Mitirb .....	117
Pîrak Kerîmo .....	118
Berf .....	119
Baran .....	120
Teriz .....	121
Bihar .....	122
Havîn .....	123
Payiz .....	124
Zivistan .....	125
Daristan .....	126
Deşt .....	127
Çiya .....	128
Newal .....	129

Zozan .....	130
Çem .....	131
Gol.....	132
Kanî .....	133
Hin Lîstik û lihevanînên gelêrî .....	135

9

### Pêşgotin

Dergûş kitêbeke ku ji bo zarokên temenê wan ji 6-7an dest pê dike û hetanî ku digihê 10-12an amade bûye. Lêbelê ez di wê bawariyê de me ew ê bi kêrî keç û xortên ku kurmanciya wan qels be jî bê.

Dergûş bi armanca ku hilfa zarokan here ser kurmanciyê û kurmancî bi wan şêrîn bibe, hatiye nivîsandin. Ji ber ku teyr û tilûr, pez û dewar û gelek tiştên di vê biwarê de bala zarokan dikişand, min jî ew tişt bi haweyê lihevanîneke ku zarok car carê pê bikenin him rave kiriye û him jî berê wan û dê û bavan xistiye hev ku dê û bav bi xwe jî baştir hînê kurmanciya xwe bibin.

Dergûş ne bi rengê ku bi destê pêşî re zarok bixwînin, ji bo ku dê û bav yan jî mezin ji wan re bixwînin hatiye nivîsandin.

Di kitêbê de, bi sebaba ku min dixwest ez bala zarokan bikşînim ser zimên û lihevanîne strankî têxim guhên wan, ji bêgavî ez derketime derveyê hin qayideyên gramerî. Nimûne: Navdêrên ku bi pirhejmariya xwe di dawiya ristê de bi “n” diqediyên, ji bo ku ziman ji herk û teqla xwe nekeve û deng bi zarokê xweş bê, min hemû avêtine. Li aliyekî hetanî ku ji dest min hatiye ez ji tewanga navdêrên “nêr” reviya me û li aliyê din jî navdêrên “mê”, di tewanga xwe a yekhejmariyê de “ê”ya ku diva bû hatibaya dawiya wan, min bi kar ne aniye.

Bi hêviya ku dê û bav bi vî zimanê me ê ku rastûrê bi hebûn û  
nebûna me a miletî ve girêdayî ye bi zarokên xwe re bipeyivin,  
xwendina kurdî bi wan şêrîn bikin û tu carî ji bîra nekin ku  
gava ziman ji neslekî derbasî neslê din nebû, ziman winda dibe!  
Û bi windakirina zimên re jî hemû tiştên mirov winda dibin!  
dibe

Laleş Qaso

Tîrmeh 2007

10

11

Werdek xatûna gunda  
tu car naçe ser tinga  
pir kubar û ji xwe razî  
disûrike ji sênga  
dimilmile û diçe  
qirş di bin de naqirçe  
ji nazik û nazdarê  
qed tiştekan danapiçe  
werdekên gunda kedî  
ên li çola jî berî  
gelekî hêka dikin  
çi a kedî, çi berî  
werdek bilind difi rin  
ref bi ref ew diçêrin  
ha li vir û ha li wir  
li welata digerin  
Werdek

12

Quling çûne zozana  
qaz hatine germyana  
werdek ketine golan  
pez kişyaye sîpana  
serkê qazê tilmikî  
lapûşkên wê çermikî  
çîmqutik û girover  
perîk jî pir nermikî  
niklê qazê şirikî  
av ji nikel herikî  
devlokê, qîjqîjokê  
nasekine li cihekî

Qaz

13

Kew li newal û çiya  
li nav dar û deviya  
qebqeba dengê kew e  
li berwar û geliya  
kew gelekî bi neqş e  
bi koçek û çavreş e  
dixwînin ew pir bi deng  
dengê wan zêde xweş e  
kew diçêrin bi refa  
bi gur diçin li hewa  
diqurpin û datînin  
pir xweş e goştê kewa  
kew tevdidin, pevdiçin  
bi kujtinê naqedin

lê gava hêlîn rabû

êdî ew jî diqelin

Kew

14

Bîst û yekê adarê

kew hêk dike êvarê

her tim li erdê hêlîn

çênake li ser darê

mêkew dike bîst hêka

derdixîne çêlîka

hejmar carna kê-m-zêde

sînor ewqas e heyra

Gulê, Çelê, Çiqulî

çêlkew tev dixwin kulî

ji gevzekê hez dikin

gevzeka wan jî xwelî

Çêlkew

15

Hinek dibêjin "lêdan"

hin jî dibêjin "kutan"

îcar navê Darkutok

tê ji devoka "kutan"

bi destar birxul hêran

bi mîkuta dan kutan

zimanê me çi xweş e

lêdan, kutan û kurtan

darkut dikute darê

her roj heta êvarê

karê wî her tim ev e  
her çend mehên biharê  
darkut dikute gewde  
heta qul tam vedibe  
qul jê re mal û hêlîn  
di wir de hêkan dike  
Darkutok

16

Zerzûl yan jî reşêle  
weke seyda û mele  
herdu jî yek tiştik in  
mîna Xwedê û Wile  
zerzûl dilûrizîne  
tîtik diçirisîne  
luks û lempe şewq didin  
cam jî dibiriqîne  
rengê wê belekotkî  
yanî hemû pitpitkî  
teyrkê zivistanê ye  
reşêleya wek lepikî  
dibû danê êvarê  
dilûsiyan ser darê  
hin diketin hindura  
bin sefi ka, kewarê  
Reşêle

17

Berberojk û tav û sîk  
hostayê qula çivîk

dijminê wan jî her tim  
him mar, him teyr, him  
pisîk  
çîkê, çûko û çivîk  
elok hat û çû mirîşk  
bû wîzwîza çivîka  
hemû kom bûn li dor dîk  
çivîkê li ser bana  
li kuça û kolana  
xwe pir mezin dibîne  
wek paşa û siltana  
Çivîk

18

Zinzînîka havînê  
pir in li dor Mêrdînê  
xwe didin bin berqefa  
rojên germ wek hêtûnê  
reşbeleka ser tehtê  
diherike ber latê  
kurman dinikilîne  
wek genimê liqatê  
Zinzînîk

19

Dîko xwe da ber sîkê  
bû qidqida mirîşkê  
çîçika kire wîtwît  
elok revya koxikê  
hate hêka mirîşkê

dîk beziya enîşkê  
çirtvirt kete çîçika  
zelq pijiqand elokê  
mirîşk çûye ser hêkê  
kurk ketiye serşokê  
Fatê qêriya tazî  
pisîkê dada motkê  
mirîşka li ser tinga  
nikil mîna mûçinga  
zibil dixurbilîne  
ha tevdide bi linga  
Mirîşk

20

Ji avê tê çelq û pelq  
dîk û mirîşk dikin zelq  
çêlîk û çîçik jî tev  
habela berdidin telq  
belav kir garis Rindê  
kurkê nikiland erdê  
bi pîtpît û wîtewît  
çîçik rabûn govendê  
bû qurqura çirçirkê  
çîçik bezyan bin kurkê  
bi wîzwîz û çîzevîz  
nikilandin berkurkê  
Çîçik

21

Gulpik sorê elokê



serpiçûk, xudxudokê  
bes têkeve ziyana  
were malê gerokê  
eloka pîjaq dirêj  
bêaqilê ker û gêj  
kesmûka zêd tevdide  
dixwe ji cehê werbêj  
elok ji dîk mezintir  
dîk ji elokê çûktir  
mirîşk û qaz û werdek  
elok ji tevan xurttir  
şev sar e, tarî, reş e  
hêka elokê xweş e  
ji goştê wê hez dikin  
mela û şêx û keşe  
Elok

22

Mar sûrikî hêdîka  
bû çîzwîza çivîka  
elok ji wir reviyân  
dîka da pey mirîşka  
dîk fi rîya ser dikê  
awir berda mirîşkê  
bi qidqid û xudxuda  
hevdu birin enîşkê  
şing û ping û ding û ding  
dîko bazda ji ser ting  
zarok zû pê ve gihan

girtin bi qepera ling  
dîko mêrê mirîşkê  
kirin qidka qedîşkê  
yanî zaroka goşt xwar  
li ser rêya Siwêşkê  
Dîk

23

Meyir û şotav û dew  
zelore, bilbil û kew  
pir xweşik û şêrînin  
dengê wan xweş û bedew  
em çûn nav bexçê gula  
dihat dengê bilbila  
dibiland û dixwendin  
hemû ji derd û kula  
bilbilo birîndaro  
dil piçûk evîndaro  
hemû ji destê gulê  
ma ye bê cih û waro  
Bilbil

24

Her digot wê “pe” û “pûk”  
navê wê jî bû “Pepûk”  
li ser daran dilûse  
ew teyrika baş piçûk  
pepûk tê nêzîk mala  
lê her ew li newala  
hez dike ji nav mezel

xirbek û cihên vala

Pepûk

25

Def û zirne û bilûr

teyr û tilûr û şalûr

ji bilî van jî hene

rovî û hûr û pizûr

şalûr teyrîkek bi reng

dilûrizîne bi deng

dijminê mêşên hingiv

dike mîna zerazeng

şalûr pir bûn bi refa

difififi rîn li ser gunda

li mêjdana dibûn diz

êrîş dikirin mêşa

Şalûr

26

Req û req, teq, teq û teq

niq û niq, çeq, çeq û çeq

tiq û piq, şeq, şeq û şeq

teyrkê belek,

porê xelek,

henek menekkkkk!

çik û çik, tik, tik û tik

ik û ik, lik, lik û lik

hik û hik, pik, pik û pik

xaltî-metik,

ser bi şûtik,

rû bi pitikkkkkkk!

Legleg (dûrik)

27

Teyro teyrê mirîşka  
dixwe ew çûk û mişka  
ji hewa tê wek tîrê  
xwe dadide keroşka  
teyr hemû jî difi rin  
gelek ji wan diçêrin  
hin ên laş û bereta  
hin jî goştê nû dixwin  
teyro naçe ji dor gund  
pir li jor û pir bilind  
çav berdaye koxikê  
digere li dîkê rind

Teyr

28

Turliyê li dor çema  
nikil zer mîna şima  
gewde bi qas lepekî  
pîjaq dirêj wek çiva  
turlî ji teyrkê çêrê  
çêre jî li nêzîk rê  
dinikilîne bi lez  
dinere li derdorê  
çiqçiqqa germa tavê  
turlî dide nav avê  
ha diçin û wa diçin

heta av dighê navê

Turlî

29

Kundê danê êvarê  
fi riyabû ser darê  
zarok derketin fercê  
civyan li navtarê  
gundî ditirsin ji kund  
pir bê hawe gelek tund  
dibêjin "bê oxir e"  
vêdixin çira û fi nd  
kundo reysisê çûka  
dijminê xilt û mişka  
xwarina wî tim goşt e  
pir dixwe gumgumoka  
Kund

30

Hêlîn, koxik, borangeh  
cihê wê tam asêgeh  
dixwe genim û garis  
nan û dan û nîsk û ceh  
şev û roj û meh û sal  
kevok fi rya ji kendal  
bi rojê her diçêre  
êvarkî jî ew tê mal  
kevok li ser zinarê  
liba dibe nazdarê  
dimeşe tena tena

bi qapanê kubarê

Kevok

31

Başoke jî teyrik e  
teyrikekî sivik e  
ji jor ve wek tîrê tê  
li çûk dixê, radike  
başoke zêde zîz e  
li hewa pir dilîze  
naxwe goştê mirara  
hemû tiştên wî teze  
nayê gund û bajara  
nalûse li ser dara  
hêlîna xwe çêdike  
li xiram û zinara

Başoke

32

Têtî ha ha dikwîtî  
her gav birçiyê û tî  
ji koleke, beraşe  
hinekî hûrtir têtî  
li qelaç û guhera  
li gund, li ser bêndera  
diçêre têtî mêtî  
li çol û li devera  
têtiyê ser bi kumçik  
kumçik jî weke şaşik  
mîna ku limêj dike

ha dileqe çik û pik

Têtî

33

Kûçik û tajî hevser

xazik jî ji cinsê teyr

çêre, berete, mirar

ha ha dixwe ket û ber

xazik reş e wek qîrê

diqîje û diçîrê

gava dibe çandinî

nav erd dikin wek gêrê

dihatin ew bi refa

pir bûn wek ava çema

bi kujtin û girtinê

li welêt teyrik nema

Xazik

34

Serê wî mîna gokê

tiltivîk wek kevokê

li ser daran dilûse

pir direve ji rokê

tiltivîk tam gewrik in

perîkên wan nermik in

dilivin hêdî hêdî

ewqasî ne sivik in

tiltivîk xweşik û rind

pir ditirsin ew ji kund

mîna kewa diçêrin

lê ew tèn nêzîkî gund  
Tiltivîk

35

Qîjqîjokê qiragê  
tu bûyî wek pîjdankê  
ma ne bes e ewqas jîn  
te xwe bire helakê  
du sed û pêncî salî  
qirag dijî li yek warî  
temenê wê pir dirêj  
nexweş nabe tu carî  
laşê wêna wek çekur  
laş jîndar mîna tivir  
çînî goştê wê dixwin  
û goştik jî zêde çir

Qirag

36

Zelo zilo zefore  
bi erdê re difi re  
ji nav zadan naçe der  
terî belek, nîkil zer  
zeforeyê biharê  
dûr ketiye ji ser darê  
hêlîn çêkir li ber tûmik  
tûmik xwar bizna şinik  
Zefore

37

Can û man lîqlîqî can



dil û mil mîna bacan  
ker û kurtan,  
qetya hêlan,  
ax û eman,  
ka Silêmannnnn!  
serûman yeman yeman  
lingûman eman eman  
dev û diran,  
mîna mircan,  
biskên qeytan,  
de Silêmannnnn!  
Silêmanê dunikil (dûrik)

38

Çêlekê golik anî  
dêlikê cewrik anî  
mîhê za berxik anî  
bizinê karik anî  
kerê jî dahşik anî  
de bide hinek nanî  
ji bo min li hev anî  
Ev dizên

39

kurk qerimî li ser hêka  
çûk qerimî li ser hêka  
teyr qerimî li ser hêka  
bû wîtwîta çêlîka  
Ev kurk dikevin

40

Mîh

Şîr şîrê mîha qîr e  
mastê wêna tam tîr e  
pir xweş e nîvişkê wê  
her gav taştêya mîr e  
mîha li nav simbila  
gelek dike pişkula  
beroşek av vedixwe  
bi rê de dimilmila  
mîha me pir bi kemêl  
pişt û parxwan tev de vêl  
totikê lê xistiye  
mexel ketye bûye kêl

41

Kûçik diçe gur bi gez  
beran dide pêşya pez  
li dengê zengilê wî  
kerî ha ha tê bi lez  
xwe nêzîk berên nekin  
hin beran pir poşek in  
çere mere nizanin  
lê dixin pir wêrek in  
beran bavê berxikê  
ketye pey mîhikê  
sênga sênga dimeşe  
ap û xalê karikê

Beran

42

Diya karikê bizin  
ê mê wê ceh û kizin  
çi dikeve ber dixwe  
natebite weke cin  
bizin pezeke pir jîr  
tim tije guhan ji şîr  
serê qiloça zirav  
weke şûjinê wek tîr  
bizin poşek gelek nahs  
pîr ji ber direvin xwas  
bi rû ye bê fêdî ye  
guh nade nas û nenas  
Bizin

43

Nêriyê li nav lema  
qiloç dirêj wek rima  
hawêrdor dimeyzîne  
çava dide bizina  
nêriyê li ser bîra  
jê tê pir bêhna sîra  
vaca vaca bi qapan  
dimeşe mîna mîra  
pirça nêrî dirêj e  
rîha wî bi qirêj e  
ji petêxan hez dike  
zebeşan dikevêje  
Nêrî

44

Wilo, wisa û wiha  
xezala deşta Riha  
li beyaran diçêre  
dixwe pûşik û giha  
xezal bedew wek çira  
fanos û lempa dila  
dijminê wê yê mezin  
insan û şêr û gura  
xezalê serî hilda  
gav radan û xwe kil da  
sekinî û ziq nerî  
xezalê bi vir da-wir da  
xezala çav kil dayê  
kulîlka ber çemayê  
nêçîrvano bi dû de  
dibeze mîna bayê  
Xezal

45

Mirîşk û werdek û qaz  
tivr, şelim û pîvaz  
li ba kesê misilman  
ha kûçik û ha beraz  
mû, hirî, teşî û rês  
beraz hinkî bêmirês  
zîrek û jêhatî ye  
mîna gule û risês

Beraz

46

Rabû bayê zîpika  
Zîto li ber karika  
zîpik ha ha bariyan  
berxika dan lotika  
Zîto rahişt tertika  
û dawîşand karika  
vê carê jî hemiyan  
bi hev re dan zîtirka  
Zîto reqand çepika  
da dilê wan xweş bika  
karik û berxikan jî  
dan çirtik û virtika  
Kar û berx

47

Ez û tu û wî û vî  
gur û wawîk û rovî  
ji mirovan direve  
peza berî pezkovî  
pezakovî bê şivan  
bê axur û navnîşan  
li çiya û newala  
dijî li wir, dera han  
Pezkovî

48

Kûçiko pirç nermiko  
terî xwar, zik cewdiko  
bi toq e, şibaqkirî  
devreşo bi gulpiko

wek kûçik tune bêhnok  
rovî jî pir xapînok  
hevalê herî sadîq  
kûçik û hespa bezok  
kûçikên li ber peza  
him girs in û him beza  
gura dixeniqînin  
bi lep û pê û geza  
kûçiko bes bireyê  
şev reş e wek teniyê  
çarhawêr me qar bû ye  
tu jî têkeve xewê  
Kûçik

49

Bejinxelek, cansivik  
ling zirav mîna qeysik  
çav kespikî, serşûnik  
tajî ji cinsê kûçik  
tajî da pey keroşkê  
keroşk jî çû wek gokê  
lê terpilî ket cokê  
li çiyayê Bagokê  
Tajî

50

Ne kûçik e, ne tajî  
tişteki qilopazî  
ew jî maye heyirî  
bavkûçik e, dê tajî

serê wî wek ê kûçik  
lê çavên wî pir hûrik  
ne zirav e, ne qalind  
bejin qutî ye, kudik  
Toltajî

51

Çêlîka mîhê berxik  
a bizinê jî karik  
çêlyên kûçik û tajî  
jê re dibêjin cewrik  
cewrik pir dinûzînin  
dû re jî diewtînin  
gava çêdibin kor in  
piştî demkê dibînin  
Cewrik

52

Nema, çima û hema  
keroşka li ber lema  
petêxan dikevêje  
dayê nehat li kuma?  
êvara serê salê  
keroşk kişya berpâlê  
tajiyan dan ser piştê  
zeft kirin li newalê  
keroşk jî pir henûn e  
lê bi qasî xezal nîne  
salê çend caran dizê  
gelek çêlîkan tîne

Keroşk

53

Pilalûk û şahî û deq  
kort û koncal û xindeq  
çêlîka keroşkê jî  
navê wê bi xwe xirneq  
çêlîk gewrik û bozik  
carna şînik û gewrik  
li dê û bavê diçe  
xirneqa terî kinik  
Xirneq

54

Pişo, mişo, pişokê  
serpiçûk şîmamokê  
ji hindur pir hez dike  
dernakeve ber rokê  
pisîka Mala Zînê.  
xwedaye ber kulînê  
mişko dîwar tev qul kir  
rabe ji ser livînê  
pisîka pir hevalê  
nazdarîka nav malê  
sernerme çiqas henûn e  
şêrînê pir delalê  
Pisîk

55

Bapîrê golik e ga  
mêrê çêlê conega



gamêş ji wan girstir e  
hemû dixwin ceh û ka  
ga girs e û zexel e  
tam xwire û şepel e  
pir ji axwir hez dike  
dernakeve der çele  
gayê pîr û xesandî  
zikelêr guh kewandî  
virikî bûye dîsa  
şolikan hûr dirandî  
Ga

56

Gamêş ji ga xişintir  
ji qedenê jî hûrtir  
şîr û mastê gamêşa  
ji ê çêleka xweştir  
hênik û germ û serma  
gamêş dikevin çema  
qeymaxê wan pir xweş e  
bi hingiv, dims û xurma  
Gamêş

57

Vekişya û xwe danî  
vî boxeyê sipanî  
da ber poşa û hilda  
mêrik avêt totlanî  
boxe noyekî dijwar  
ku hêrz dibe ya star

ji boxe dûr bisekin  
çavsor e ew zêde har

Boxe

58

Rêxa çêlekê pir e  
zik mezin, dev çatir e  
gava çêlek hêrz dibe  
zêde zêde bê cir e  
çêlek hinekî kur e  
yanî dewarek xwir e  
çavên çêlekê mezin  
zimanê wê zivir e  
ker û dahşik dizirin  
gur û wawîk dizûrin  
ga û çêlek û gamêş  
ew jî hemû dihorin

Çêlek

59

Boxe, gamêş, gergedan  
hersê jî topên giran  
hildidin û lê didin  
bi qiloç û bi poşan  
bê mirês û bi girêz  
hinekî mîna berêz  
hûr mezin, serkubiko  
gelekî zêde bi hêz

Gergedan

60

Bê hefsar û bê kindir  
golik revya ji axur  
xortên gund lê derketin  
ha ha bezyan vir û wir  
golikê beza û gir  
li gund terpetoz rakir  
bi lotik û zîtirkan  
kom li ser xwe giran kir  
bi qêrîn û navtêdan  
hewar kişya bû ferman  
eskerên gund jî li ser  
dan pey golik bû halan  
golikê Mala Zerê  
zeft kirin li guherê  
çêlek bi kêf oriya  
çîrok heta vê derê  
Golik

61

Hêştir ji fi lê hûrtir  
fîl ji hêştir xişintir  
herdu jî karin bazdin  
lê hêştir ji wê xurttir  
li welatê ereba  
xelk dixwe goştê deva  
şîr û mastê wê nexweş  
mîna ava kezeba  
deşta Şamê bi kevir  
hêştir têra xwe bi gir

dema ku ew hêrz dibe  
geza dide pir bê cir  
Hêştir

62

Li welatên Efrîka  
fîl pir bûn wek gêrika  
baran nehat tev qelyan  
hin man ji bo heneka  
bêvila fîlê dirêj  
ma ne wisa bavo bêj?  
dev û lêv û pişt û şeq  
her derê wê bi qirêj  
Fîl

63

Fîl ji qedene girstir  
kerdane ji fîl xurttir  
û ji hesp û qantirê  
bi qewet û xişintir  
li welêt û Kurdistan  
qedene hebûn, neman  
ji bo fercê û kêfê  
çend mane li nav tirkan  
qedene yan kerdan e  
haho ev çawa nav e  
me ker wek ker dizanî  
lê gir bûye girdan e  
Qedene

64

Rûnê çêlekê zer e  
bavê qantirê ker e  
diya wêna jî bergîl  
rast e, ne çere mere  
çavên qantirê tam kort  
qantir zirz e wek pizot  
karê giran pê dibe  
lê ew pir xweş dike cot  
Qantir

65

Hesp dixwe sernerm dibe  
pez dixwe henûn dibe  
bergîl çiqasî bixwe  
ewqasî tirek dibe  
bergîl tê ji nav reza  
lê siwar bûye Deza  
çeng bû, şîhand bergîlê  
li wan daye teriza  
bergîl zemanê berê  
bi qîmet bû li her derê  
kar û bar tev pê dibû  
delaltir bû ji kerê  
Bergîl

66

Çêlîka hesp û bergîl  
ciwanîk ellahwekîl  
tu çi bidê nayê dest  
qed fêde nake bertîl

ereb û tirk û urûs  
ciwanîk nehs û şemûs  
ha ha dide lotika  
ew heywanka bêmikûs  
Ciwanîk

67

Adar e dew li dar e  
bûk li hespê siwar e  
çavên zavê qerimîn  
xesûyê pir sersar e  
hesp dibeze rehwankî  
bilezîne dilewkî  
gava dide çargavê  
ew jî dibe telebkî  
hesp ji xezalê xurttir  
xezal ji hesp siviktir  
hespa bi bûjî, gulî  
ji tajî jî bezatir  
Hesp

68

Kerê kire zirezir  
dû re jî berdan çend tir  
zarok hemû keniyan  
xwedî ji ber fedî kir  
sermezino guh dirêj  
lê bêaqil e û gêj  
ji şotavê hez dike  
kerê kurtan bi qirêj

kerê li nav garanê  
zik pêpîk wek hebanê  
keçikan serkulên wî  
kişandin kozîdanê  
kero bavê qantirê  
dageryaye çolbirê  
li ser çil û mila xwe  
ket pêxêla dêlgurê

Ker

69

Çêlîka kerê dahşik  
him şêrîn e, him xweşik  
terî kin û guh dirêj  
newq ziravî, ling tîşik  
bivir û tefşo û das  
dahşik bê cir e û nahs  
diya xwe pir dimije  
dev bi bizmik û kubas  
dahşik dide çirtvirtka  
car carê jî zîtirka  
dibeze, dilikume  
diavêje lotika  
aşvanî, qeraş û aş  
hesp gihaye serê kaş  
navê çêlîka kerê  
dahşik û kurîk û cahş

Dahşik

70

Ji kerê pir siviktir  
û ji dahşê jî xurttir  
nasekine li cîkî  
ew meymûnka qûn bi tir  
meymûn her gav dilîze  
him dixwe, him dimîze  
bi henek û devliken  
ha dike çîz û vîze  
meymûn diçe ser dara  
dik û lat û dîwara  
pir jîr û jêhatiye  
fêhm dike pirê cara  
Meymûn

71

Kurum û pîvok û xilç  
ji hingiv hez dike hirç  
şeq û zik û lep û pişt  
her derê wêna bi pirç  
ji çem digre masiya  
ji darê jî hirmiya  
çi dikeve ber dixwe  
hirça li çol û çiya  
ziman dirêj û zivir  
diran qewîn wek bivir  
her tim bi a xwe dike  
serî hişk mîna kevir

Hirç

72



Ha werin malê mirî  
şahidê gur e rovî  
şêrko jî bûye hakim  
dizire ker ha digrî  
wawîk û keftar û gur  
her sê har in wek bivir  
ne ew baş û ne ê din  
yek ji yekî xerabtir  
wawîkên li nav werza  
êrîş dikin bi geza  
lê ku tu desthilînî  
direvin ew pir beza  
Wawîk

73

Hirç ji keftar mezintir  
kûçik ji keftar çûktir  
gur ji wawîkê, keftar  
xweşiktir û paqijtir  
keftar zexel e, xewar  
lê li nêçîrê dijwar  
kûçik ji ber direve  
bi nûznûz û carecar  
Keftar

74

Guro diran biviro  
cihê wî kun û qulo  
bi rojê tim radizê  
bi şev li vir û wiro

awirên gur dijwar in  
gur pir devlok û har in  
bi şev diçin nêçîrê  
nêçîr pez û dewar in  
kûçik reya gur zûrya  
ji newalê ker zirya  
şivan bi hêrz qêriyan  
pez jî ha ha bariya  
gur jî ji dola kûçik  
yanî herdu bavkûçik  
yek kedî ê dî berî  
ferqa wan ewqask çûçik  
Gur

75

Derpî, navran, devdeling  
li himberî şêr, piling  
şêr û piling, leopar  
hersê jî mîna tiving  
şêr girs e, piling hûrik  
yek giran ê dî sivik  
piling xwe çeng dike ser  
û direve wek çipik  
Piling

76

Ro gihabû delava  
pez kişyabû ser ava  
rovî li gund bûbû diz  
malî çûbûn berava

rovî dada koxika  
bû qidqida mirîşka  
qaz yek bi yek çûne pêş  
dîka xwe da enîşka  
tep û rep û çirtika  
bû wîtwîta çîçika  
rovî gez kir vê û wê  
cefi l kete werdeka  
bû tuxtuxa eloka  
rovî girt zengelorka  
çarhawêr deng belav bû  
hat hewara kûçika

Rovî

77

Li çiya û zozana  
axayê daristana  
ew jî tam mîna insên  
dijminê tev heywana  
şêrê bi hêz, lep tapan  
derbên lep zêde giran  
ser mezin, terî dirêj  
diranên wî wek mîxan

Şêr

78

Sîxur jî mîna jojî  
perên wî tev bi dirî  
ji elokê mezintir  
lê xuya nake terî

per û sîx yan jî kelem  
hemû rast in wek qelem  
sîxan davêje mirov  
sîx jî tam qul dikin çerm  
sîxurên me qediyar  
hemû ji dest gundiyan  
lêdan, kujtin, dirandin  
heta ku tev qeliyan

Sîxur

79

Mişko mişkê terîreş  
li hindur bûye keleş  
didirîne, qul dike  
malî xistin qaqareş  
mişkê binê neqebê  
xwe avêt bin mekebê  
kişya nav beroşa şîr  
Nazê rahişt lewlebê  
mişko da nav savarê  
ji wir jî çû kewarê  
Nazê kire qîjewîj  
pisîk hate hewarê

Mişk

80

Xilt ji herdu çavan kor  
û dibeze der û dor  
binê erdê dikole  
axê dipekîne jor

cihê xilt binê erda  
cirdon qul dike ferda  
xilt qed nayê nav malan  
warê wî binya gunda  
Xilt

81

Jojiyê çerm bi dirî  
tim di qalik de serî  
bi rojê pir radize  
bi şevê jî digerî  
jojî dixwe mişk û mar  
hemû lepek ya stra  
maro ji ber direve  
bi kuf û pif û harhar  
jojiyê bêvil tûjik  
dernakeve ji qalik  
gava ket teştâ avê  
ha vedibe wek paçik

Jojî

82

Sihorê terî sorik  
disûrike pir sivik  
bi daran hildikişe  
xwe çendike ser şaxik  
sihor dixwe kakila  
gîha, mîha, şaqila  
pir hez dike ji gwîzê  
şahbelot û baqila

Sihor

83

Ava golê qerisî  
rovî li guro pirsî  
dora çemê Xabûrê  
tije kûsî û mûsî  
hênike bayê sibê  
pişta kûsî wek qubê  
serê wî ê piçûçik  
mîna gupka lewlebê  
kelkela germa rokê  
kûsî çûye ber cokê  
ji dûr ve xuya dike  
mîna tepik û gokê

Kûsî

84

Bê sol, pantor û şerwal  
şilfîtaziye kevjal  
ji nav avê naçe der  
bi rojan û meh û sal  
kevjal bi lapûşk, çengel  
çengel û lapûşk jî bel  
dimeşe şeqlovîzkî  
vaca vaca û bi tel

Kevjal

85

Mar û dûvpişk û şahmar  
hersê jî wek hev bi jahr

gava hat û pêvedan  
pûrta serî tînin xwar  
tajî xurt, keroşk qels e  
mar ji dûvpişk ditirse  
deve ji şêr mezintir  
gur jî hûr çêlek girs e  
dûvpişkin jê reşbelek  
terî bi movik, xelek  
li çiya, li nav xirba  
li daristana gelek  
serê teryê bi çengel  
çengel jî tam dike bel  
rast û rast diçe û diçe  
lêdide ew tam bi şel  
Dûvpişk

86

Li çiya, li zinara  
li şûv û li beyara  
xuya dike gumgumok  
mîna dûvpişk û mara  
gumgumoka çermqalind  
jê werê pir serbilind  
aşiqê bejna xwe ye  
şîv û fi ravîna kund  
Gumgumok

87

Çiyayê bejî û req  
welatkê me bû çar şeq

çem û gol û çal û hewd  
vedixwin avê jê beq  
beqê beqa şeq fi reh  
zik û pişt weke rekeh  
devê wê mîna heskê  
laş bi carekê ve reh  
dê û dot û bav û kur  
beqa çerm mîna çekur  
av dide beqbelûska  
ji ber dike qurequr  
Beq

88

Ga û masî gamasî  
yanî masyê zir masî  
ji nav behrê ê mezin  
bi tenê masî, masî  
goştê masî lexrik e  
xweş û meş û nermik e  
ha bixwin ha ha bixwin  
temen baş dirêj dike

Masî

89

Ev kitêba ha bi nirx  
çermê tîmsehê wek zirx  
xwe vedişêre binav  
ji nişkê ve dibê "pix"  
timseh him har û him hov  
êrîş dike pir bi xov



ew tu carî natewe  
bi rot û dar û bi çov  
ji girik û çirikê  
ji teqan û pirikê  
zêde zêde hez dike  
ser taqoz dev şirikê  
Tîmseh

90

Mar dikole jêr û jor  
wek metqebê û miqor  
qula wî pir dirêj e  
dizîvire hawêrdor  
maro tu şilfîtazi  
çawa wilo radizî?  
derkev ji qul û milan  
çav kor bûn, gewde rizî  
marê li nav teyarê  
kişiyaye bin darê  
xwe kiriye gilofîk  
da bigre çûk êvarê  
maro dikeve pey mişk  
û direve ji dûvpişk  
dixwe kêzik û çûkan  
marê revok, terî hişk

Mar

91

Moz heye, mozqirçk heye  
moz sor, mozqirçk zere ye

li dinyayê reng bi reng  
lê li welat wilo ye  
moz mezin, mozqirçk hûr e  
kulmoza mozê kûr e  
kulmoz cîh e û hêlîn  
hêlîn jî mîna tûr e  
moz havînê pir har e  
hinekî mîna mar e  
goştê miraran dixwe  
pêvedan pir dijwar e  
Moz

92

Mêşa hingiv difi re  
bi lapûşk, bask û per e  
bi şevê her tim bêdeng  
bi ro jî her digere  
mêş diniqîne gulê  
û pincêr û xuşîlê  
lêbelê pir hez dike  
ji kulîlkên şehfelê  
mala mêşê ye mêjdan  
mêjdan bi qas kozîdan  
vedixwe mêşa hingiv  
ji gol û çem û hewdan  
Mêşa hingiv

93

kêzikeke xweşik e  
difi re henûn henûn

canê wê pir nermik e  
perperîka rengareng  
qed jê nayê his û deng  
ha difi re, datîne  
li wir namîne dereng  
Perperîk jî kêzik e  
Perperîk

94

Hez kirê gulê bilbil  
kulî hevalê qumbil  
êrîş dibe ser simbil  
simbil dike mîna zil  
kulî zikbirçî, xwur e  
gihê û pincêr dixwe  
devê xwe jê dernaxe  
heta piçek nemîne  
kulî hatin bi refa  
dadan genim û ceha  
aş sekinê ard nema  
li hin ciha bû xela  
Kulî

95

Qumbil kêzikek hûrik  
bi lapûşk û çermzerik  
girover ew nafi re  
li ber bê diçe sivik  
ceh û genim û simbil  
dikeve navê qumbil

dimije, dirizîne  
heta pûç dike kakil  
bêhna qumbil genî ye  
devê wîna kurmî ye  
her der mer der bêmirês  
serê wî wek tenî ye  
Qumbil

96

Çi daristan, goristan  
çi çiya, sîpan, zozan  
hema hema li her cî  
xwedî war bi moristan  
seqem û berf û baran  
ba û agir û dixan  
qira mîrokan tîne  
tofana herî giran  
mîro pir xebatkar e  
ne zexel û sersar e  
li vir, li wir, li ser rê  
hema her tim bi bar e

Mîro

97

Zeko, Tilkê, Zengilo  
Pîrhesamê, Gilgilo  
herpênc gundên Amedê  
ev çi nav wilo çilo?  
dar û devî û çilo  
kêzik e pilopilo

di erdê de dikole  
kortikên qulo milo  
pilopilo gewrik e  
wek morîkê hûrik e  
ji axê, tirabêlkê  
zêde zêde hez dike  
Pilopilo

98

Werîs bi îçk û serî  
xalxalokê bihurî  
oxirê gel xwe tîne  
zû jê re vekin derî  
xalxaloka bi du çeng  
divizîne xwe dereng  
ji kulîlka hez dike  
sorbeleka rengareng  
Xalxalok

99

Kurmo tu mîna badok  
tirsonekî tu bizdok  
bes qul bike vir û wir  
te erd kire wek safok  
kurmê li nav tertika  
ha ha dixwe tûmika  
tu têrnabî ji gîhê  
gurê nok û şolika  
kurmikê koka dara  
xuya dike êvara

rehikan dikevêje  
tîne xwar sipîndara

Kurm

100

Şêx û mele û qazî  
kêzik e qazîmazî  
bê çi xweşik li hevhat  
ma ne wilo birazî?  
ev kêzika biharê  
bask şîfon, zik kewarê  
xwe qulopazî dike  
ji sibê ta êvarê  
kêzika teqleavêj  
bêhiş nakeve, sergêj  
ne gemar û ne genî  
paqij e ew bê qirêj  
Qazîmazî

101

Îşev şeva sersalê  
kufl et hemû li malê  
xwarin marin her tişt pir  
da lotikan jinjalê  
qirdik wa ye tê bi lez  
zarok pêrgî çûn bi bez  
ji kêfa re qêriyan  
hemû kişyan hev bi gez  
zarok ha dixwin şekir  
li her derê xirecir

xort ketine govendê  
li mala apê Bekir  
kartol mertol û petat  
sersala me bi xelat  
dayê bavo berneda  
hetanî ku ro hilat  
Sersal

102

Berf barî, baran barî  
dahşikê sindik xwarî  
gur daketin ji çiyê  
şeva sar, reş û tarî  
mişko ket bin kulînê  
pisîk revya kadînê  
bû wîzwîza çîçikan  
çûk çûn paşya hêlînê  
kûçik û gur rabûn hev  
dirandin, poz, lêv û dev  
gundî li wan derketin  
gur bizdiyan çûn bi rev  
Şeva reş

103

Berpirsyarê pez şivan  
nahtorê dewêr gavan  
bergîl, çêlek, ker û hesp  
hemû gel hev bû garan  
dew û nanê bi zîwan  
dixwar feqîrkê gavan

ji dêvla mast û nîvişk  
didan rebenko çûrtan  
gava ku ro derdiket  
her kes bi xwe dadiket  
garan hemû kom dibû  
dû re jî bi rê diket  
gava ku dibû êvar  
gavên dikir carecar  
berê dewêr dixist gund  
çêlek dihat pir bi xar  
Gavan

104

Şivano bilûrvano  
xwedyê terşê girano  
diçêrîne pezê me  
li çiyê û zozano  
şivan li hev civiyan  
lîstin wan bi babûtan  
pez jî ketin ziyana  
gundî ha ha qêriyan  
şivan çeng bûn wek pizot  
yek beziya ê dî got  
bi qîjewîj û halan  
li ba kirin kevnekot  
şivanê mala Meto  
ehmeqo ji kerê keto  
hingî xwar nanê tisî  
lê derket pizka Peto



Şivan

105

Hatîye wextê dana  
şîr herikye guhana  
mîh û berx li hev banîn  
keça qîr kir strana  
pincêr girtye zozana  
tên refên bêrîvana  
keç û xorta dane hev  
bi bilûra şivana  
li çiya li rûbara  
li ber pala zinara  
li gundê me bêriye  
her sibeh û êvara  
Bêrîvanî

106

Bihar e li sîpana  
koçer çûne zozana  
mîh û berx tev dibarin  
qîreqîra şivana  
dew û mastê koçera  
xweştir ji ê her dera  
qeymax û nîvişkê xwe  
dixin meşk û mexmera  
li zozana, li zoma  
xweş e xewa bin kona  
zarok ha ha şa dibin  
bi deydîk û hêlana

Koçer

107

Bavê min ê bi çarox  
rahişt wî dîkê devkox  
bir bazara Mêrdînê  
da bikire qutkê çox  
kengî bavo bê û bê  
çav qerimîbûn li rê  
reşê bavo xuya kir  
bi lez dihat weke bê  
diko bi yek benqenot  
kirîbû yekî çavkort  
lê revandibûn pere  
Ezîz Belayê serqot  
çox û mox gelek tox  
min got bavo ka nepox?  
lawo Ezoyê pêxwas  
bavê te tam xist nav pox  
Bavo

108

Bavê apo û xalo  
jê re dibêjin kalo  
ka bipirsin ji dayê  
çima wisa û halo?  
kalo li gel pîrikê  
her roj diçin tevrikê  
wextê xwe derbas dikin  
li nav darên şirtikê

mala me tev de bi hewş  
hindurê hewşê bi kewş  
pîrê û kalo zivêr  
ji vê rewşa tewş û mewş  
Kalo

109

Pîrka min a pir delal  
di dest wê de tim gopal  
bê westan û bê hedan  
digere ew mal bi mal  
şimik û sol û şekal  
pîrê, kalo xweş heval  
ji me re ew dibêjin  
çîrokên sed û yek sal  
Reşê û Bozê û Gewrê  
navê pîrka min Seyrê  
dayê rabû ha bi lez  
da bide pîrê meyrê  
sêl û dustan û tevgîr  
pîrê xwe dada hevîr  
çêkir nanê şilikî  
me xwar fi rdika bi sîr  
Pîrê

110

Bavo birayê apo  
dayê jî xuşka xalo  
her yek ji yekî çêtir  
bavê hemiyar kalo

kund ji dola pepûkê  
apê min tê ji sûkê  
bavo li ser benderê  
dide hevdu çiltûkê  
apo hema bang min kir  
devê çente zû vekir  
bi nok û qidaman re  
devê min da ber şekir

Apo

111

Xalo rabû xwe kar kir  
jinxal ji xewê rakir  
barê kerê tam şidand  
paçek bi ser bar dakir  
barê xalo meşka şîr  
bastêq, mewîj û hejîr  
ji xalo pir difûre  
bêhna pîvazê û sîr  
xalê min diçe bajêr  
ser di ber de serberjêr  
diziqitîne kerê  
da zû bighê serê cêr

Xalo

112

Ker û kurtan, hefsar, qûş  
deydik, hêlan û dergûş  
zarok tev de dilîzin  
li ser gihê, li ser pûş

dew û şotav û çûrtan  
lîstika wan babûtan  
di ser hev re çeng dibin  
bi daqûl û bi hildan  
şerbik û cer, den û tas  
fi stan, derpî û kiras  
ên bê sol û bê şekal  
ji wan re dibêjin xwas  
Zarok

113

Qeşa û şîr bû qeşîr  
halet û gîsin û nîr  
ardû û agir û tenûr  
av û ard dibe hevîr  
aşçî xwarnê tevdide  
nanpêj nan pê ve dide  
dayê ranabe ji xew  
bavo gulan av dide  
Nanpêj

114

Bim û xirm û hirm û dirm  
dengê daholê bi gurm  
bûk li hespê siwar e  
gihaye serê dimdim  
xortikan dawet gerand  
keçikan jî her lîland  
Dolmîşê Mala Sifûk  
bi lêdanê def teqand

Daholvan

115

Zir û zirne, zirnevan  
dê bi qurban, bav heyran  
Meyrê çûye Mêrdînê  
bi dîk û tûrê hêkan  
zirne ha ha dizire  
kêzik ji deng diçire  
zirnevanê tengijî  
ji nepxê dizewire  
Heso xwar mastê kîs e  
dengê zirnê çî zîz e  
Gulê daye lotika  
li ber zirnê dilîze  
Zirnevan

116

Binê beroşê reş e  
dengê bilûrê xweş e  
der û dora Stilîlê  
bi tolik û kelbeş e  
kulavê me xetxetkî  
bilûr hemû qulqulkî  
bilûrvan jî bêwestan  
habela ha pif dikî  
Bilûrvan

117

Mitirb rahişt ribabê  
qîr kiriye Ziravê

xort û keçan hev girtin  
li ber germika tavê  
cilên mitirb bi kêl e  
darkê ribabê vêl e  
kodika wê tev ji çerm  
ribab bi mû û têl e  
Mitirb

118

Kerîm lawo çeqilmast  
min şîr meyand nebû mast  
kerê derî hilqerast  
pisîkan beroş alast  
Remo cîranê Receb  
geryabû li Şam û Heleb  
kirîn sê biznên celeb  
meşk û cewdik û lewleb  
dor Tixûbê bi rîşik  
bezya Fata çîm rûtik  
bi kux û pix û fi şik  
ket pey pisîka reşik  
Kerîm mêrê Fatikê  
bavê Dibo-Siltikê  
apê Simko - Mencikê  
nexwar mastê elbikê  
Pîrka Kerîmo

119

Pûka bi şev bariya  
bû sibeh zû hiliya

ji lata nisilî av  
pê şil bûn çol û çiya  
berf bi lepa bariya  
dayê pê re qêriya  
bavo çûbû Mêrdînê  
qey wê bima li rêya  
ketibû berfa giran  
li welêt qir bû heywan  
xelk tev mabû bê xwarin  
qedyabû qût û ervan  
Berf

120

Warên bi dar û devî  
baran tim lê dibarî  
biçînin dar û bera  
da cih nemînin bejî  
şev sar e, reş û tarî  
ezman bûye wek tenî  
hewr dikelin hawêrdor  
li gund rabûye lehî  
baranê bibar bibar  
şîn dibin çol û beyar  
hewd dimeyin ji avê  
paqij dibin cih û war  
Baran

121

Teriz mîna zixura  
carna jî wek kevira



ji ezmên ha ha tên xwar  
tu jî birev hindura  
gur êrîş dike peza  
teriz dijminê reza  
simbilan difififi rîne  
yekser radixe werza  
Teriz

122

Zivistan çû hat bihar  
şîn veda çol û beyar  
gihê girtî her derê  
berxa kirin barebar  
bokîna kulîlk vekir  
teyrika hêlîn çêkir  
quling, qaz û werdeka  
xwe di gol û çeman dakir  
li zozana û çiya  
xunav hûr hûr bariya  
qebqeba dengê kew e  
li nav dar û deviya

Bihar

123

Bihar va çû hat havîn  
seridîn genimên şîn  
gundiya paqij kirin  
bênder, axur û kadîn  
havîn diçiqçiqîne  
avê dipelqijîne

teht û kevir û lata  
çawa diqijqijîne  
li welêt havîn pir germ  
dikewîne goşt û çerm  
ji canê neşûştî tê  
bêhna mirara û term  
Havîn

124

Dara pelên xwe weşand  
cotkara şûv bizirand  
her kes bi qût beziya  
gundiya danû keland  
berîvanya pez gurand  
çiyayiya rûn hiland  
omerî çûn miştaxa  
wan jî tirî hesirand  
ava hewda çikiya  
teba hat xwar ji çiya  
deşt û zozan tev rût bûn  
çêra teyrka qediya

Payiz

125

Payiz çû hat zivistan  
bi lez tê serma giran  
di kewarkên hingiv de  
mêş li hevdu civiyan  
dewar ketin axura  
kêzik reviyên qula

sermê her der qerisand  
me xwe avêt hindura  
berf bi lepa bariya  
sipîbûn dar û çiya  
teba hemû birçî bûn  
gur jî ha ha zûriya  
çi zivistanek dijwar  
bê lome be ya star  
zarok marok û her kes  
di malê de qarewar!  
Zivistan

126

Gotinên bê ser û ber  
çiyayê bê dar û ber  
tew hinek jî dibêjin  
erdê bê kevir û ber  
çiyayê bê daristan  
mîna devê bê diran  
her derê wî req û bej  
zivistan lê bê baran  
çiya gava ma bê dar  
qed lê namîne star  
teyrik tev jê direvin  
hew lê dijîn mişk û mar  
Daristan

127

Êzing û mircaq û beşt  
erda rast jî dibe deşt

der û dora Rihayê  
girover e wek e teşt  
seranserê Serxetê  
û temamê Binxetê  
xwerû, yekser hemû deşt  
li wir genim zêde tê  
req e deşta Heranê  
xweş e a Mûş û Wanê  
geş e giha û pincar  
heta meha gulanê  
Deşt

128

Çiya li çiya nerî  
nava wan bû duderî  
derîk li vir, yek li wir  
tê re çûn ref û kerî  
çiyayê bi şax û per  
lê diçêrin zêde ker  
tije teba û teyrik  
deka biçe wir û wer  
çiyayê Araratê  
û sîpanê Xelatê  
nîne ji wan bilindtir  
li welatê sikratê

Çiya

129

Çi sobe û çi bi bar  
ned newala bide car

teba, yan rêbir li wir  
newal qed nake star  
ha newal û ha zindan  
mirov lê tê girêdan  
ranezê li newala  
xewn bi xof û pir giran  
newal hemû bi koncal  
li hinan jî hene çal  
nede rêya newalê  
xwe bide hêla berpâl  
Newal

130

Çiya û deşt û zozan  
sirt û newal û sîpan  
li wan dera diçêrin  
dewar û terşê giran  
keça Menîfa Werdê  
ji zozanê Serhedê  
bi mêr û zarokên xwe  
tev dijîn li Amedê

Zozan

131

Çemo çemê Xabûrê  
jê tê dengê tembûrê  
dilorînê û diçe  
mîna bayê bilûrê  
çemo çemê Bilala  
diherike newala

nêzîkî gundê me ye  
dadigre gol û çala  
çemê Dicle û Firat  
pir lewitîne, berbat  
bê westan diherikin  
li welatên rohilat

Çem

132

Mal û kon û zom û hol  
newal û çiya û çol  
li wan dera jiyar xweş  
bi çem û kanî û gol  
mezin e gola Wanê  
gol dighê ber Tetwanê  
geh nizm dibe, geh bilind  
hemû ji dest baranê

Gol

133

Baran bi xurt bariya  
li vir û wir civiya  
xwe berda binê erdê  
pijiqî ji kaniya  
li warê bi daristan  
deşt û çiya û zozan  
gelek zêde lê hene  
kanî, birk û avtêzan  
kaniyên gelyê Mava  
li ber seqemê, hewa

ava wan pir zelal e  
mîna hêsirên kewa

Kanî

134

135

Hin lîstik û lihevanînên gelêrî

136

Lîstik

Ûûûûûûûûû!

Yek, dudu,  
bawer sisê,  
çeqla fi sê,  
mamo dîno,  
kevrê şîno,  
qesra Elî,  
çar deh derî,  
yek jê derket,  
Allah û ekber.

ar tûtik,

berwar tûtik,

Şêx Geylanê devrûtik,

Mele Birehîmê serşûtik

Lîstik

Nîskê, nokê, heboqê,  
miftoqê, şabeloqê,  
Elîyê Momê berda komê  
kom şehetî, mar behetî

Lîstik

Olekê yeka nekê,  
gulo çepo, çepil mijo,  
xana gujo, dosta jînê,  
ser mizgînê, heba tirî,  
vegindirî, qulqule ye.  
Şam û şekir, bîst li te ye.

137

Lîstik

Yek û yek teyrê belek  
zaza bilbil dermanê dil  
şekû şema li ber çema  
çem miçiqî av tê nema,  
ez kuncî û tu kuncî  
ser doşeka birincî  
ez fi ryam tu ma li cih.

Lîstik

Horoza morozo  
ax di bin de koroza  
şimîmî şimamî te  
tirkî min xulamî te

Lîstika

Babûtan xweş babûtan  
çûm newala curkuçiya  
me taştê xwar,  
fi ravîn fîkand

Lîstik

Ev lîstik wilo ye:

Yek li vî alî û yek li wî alî



pê bi pê ber hev de tîn,  
yekî dibêje “biz didim”  
û ê din jî dibêje “badidim”  
Di dawiyê de lingê ê ku li  
lingê ê din siwar hat, dibe  
dora wî

Rovî

Rovî rovî rindik  
serê terya rovî qurfi ndik  
rovî çûye mala xala  
pê ketin qutedara  
bihejmêr, nehejmêr  
heger ne bîst û çara  
goştê rovî li te helala

138

Karik

Pirpizêk, pirpizêk, pirpizêk  
karik bizê,  
yek a min û yek a Hemzê  
karika Hemzê ma nîvê salê  
û a min jî ma dotira salê.

Kêzê

Baran hat tertik hilya  
ba rabû qirşik fi rya  
hingî kêzê kenya kenya  
rovî tirtirka wê qetya

9

DOZEXA SIPÎ

Roman

Hesen Îbrahîm

Cade ya sipiye,dar sipî ne,şev ya sipî dibit,mirov yên sipî dibin,gilîlên sipî bisivanda ve şûr dibin,xûna leşê wî ya sipî dibit....

ew kabîna telefonê, ewa bûye mala wî,heta nîvê ya sipî buy,sermayê dil lê sipî kir....

- eve ew kabirayê he ci dibêjit?Digel kê diaxivit? Manizanit,ew kabîne mala mine?Nihu demê nivîstina mine?

Tu dibêjî,wî jî hindek hebin lihîviya wî?!

Dibit nihu digel yara xwe diaxivit,dibêjtê:

- ez dê êm,ci nemaye ,ez dê eme cihana te . yan jî xemên xwe bu dayika xwe vedigêrt!

Lê ez jiserma mirim,ez jicîhana rojê hatîme, cihana befirê,!Roj û befir hevidjin!!

eve hinde ci dibêjit?!Bu mala min vala na ket?!Nihu demê nivîstina mine

Sipiyatiyê livîn rawistandin,hizir rawistandin,baw baruve,libilindahya xwe sipî dibun,dibune peyker!

Lişevên husa.Serma û birs dibine bira,digel hejariyê û nexuşiya dîlanê dikin.

Leşê wî yê lawaz,baştirîn gurepan bu,bû dîlana wan,lê xûna wî ya dijwar,her berevanî jituxybê giyanê wî fikir. Dibire rojên welatî,lizivistana û liber sopa dara û kuçik û tenûra.car jî digê^uka şer û şûra liçiya û aqara,liber sir û seqemê,Dişkefit û bin kevira da!

Vê carê ne çiyaye,ne kevir û darin..Vê carê ne welate û ne kes û karin,pê bixurt..!

Vê carê cadeka dirêj û berfirehe,liwelatekê bê dil.. Kumpyuter û kargeh,desthelatdarin...

Kes vî demê şevê jimala xwe dernakevit.Jiblî wî û wî kabirayê he!! dibit ew jî ne mirovê vî serdemî ye!

Wesa diyare,xemên wî jî gelek digiranin.lewra vê n<sup>^</sup>evê,livî welatê sêwiya,likabîna wî buye mêvan.

-ez mêvana,na hhûnim,min cihê mêvana nîne,lezê bike, cihê min vala bike....

Şeverok,koçik û dîwan,heval û mêvan,çîrok û stiran, beyt û suhbet,axiftinên xweş,dewat û yarî,jiyana gunda.

Wek fîlme kê reş û sipî dihate pêş çavên wî.

Wî ne dizanî bu wesa reş û sipî dibun?!

erê jiserma bu? yan jikevnatiya hizrên wî bûn?

Wê şevê bibu labura hizira...!

Çi nema bu hizir ne kirî.çi nema bu xuzîk bu ne xwastîn, lê her xuziya wî ya mezin ew Bu,ku ev kabiraye mala wî vala biket,berî cîhan hemû sipî bibit!!

Çade wek wêneyekê futugrafî xweya dikir.tinê lêvên wî dilivîn....

- min sare... Min sare....

- min sare

Dîsa..? Wek her şev?

Cend gildên malê biser dadan û xwe pitir nêzîk kir da germa le şê xwe bidetê..

-erê, û hêştta zêdetir.ez mirim jiserma...

Wek bîha diavêda dilerzî û xwe dikir qurmik û têtira...

- dinya xweşe,bihare, ne sare...Lê tu ne yê dirusitî..

Tu yê nesaxî,yan jî ditirsî?

Destê xwe dana ser enya wî

- tirs? Ma tirs bu kengiye ?eve nekarê miruvê fama ye ,eve xwe kujtineka aşikiraye! Dibu çeçiçeqa didanên wî û lêvên wî dilerzîn...

- neçe, makê rahêlaye te? Ma çi jite kême?

Mal,Xanî, turimbêl, jin û bçûk.ne kes dibin tera û ne kes diser tera, tu lawê dilê xwey.Ma dê bu bidestê xwe mala xwe wêran kî?

- dê her çim.. Min dikan firut,xanî firut^ulê xwe hêla, divêt ez biçim...ya bumin Buye rik û mereq!

her weki sere wi ye wermi, yan ye ser xweş, gelek cara tişt lipeş çava dibune du,se, diviya her xwe direj biket û binivit.Guhen wî ne diviyan çi deng nezîk bibin.

Leşe wî her giran dibu,wî diviya ev şeve çi car ne bite roj.wî diviya ew uxera wî Liber,bibite xewin,bila her diwe xewine da ye nivîsitî bit,kes hişyar neket,bila ew pılan û xebata hinde kirî,diber ave da biçit,bila her tişte bibit bila bibit, tine ew bimînit nivistî heta mirine...

Le nivistin ne çareye,nivistin ne dawiya hîviyen wîne..

Divet her rûdaneka mezin dijiyana wî da rû bidit.

da bihayê xwe û rojen burî bizanît,da bihayê welat û hevala bizanît...

“ divet ez jikevlujanke xwe der kevim,divet ,divet ez husa biasany nemirim “

Le wî divet,nihu ter binivit, kes jixew hişyar nekit!

Wî mile gerim,mile wî hejand û gute:

- tu dizanî,newesaye wek je dibejin?

Biraye te bişolîve mir,heta xwe xudan dikit,

Te dît çewa behse were dikir?

her we kû nuba wî bu sedare hatî.hizren wî wek mişken jiber kitka direvin,hemû Berzebun,leşe wî gerim jibîr kir. çi ne hate bîra wî,nizanî de cewa bersiva we det...

Diviya xwe ture kit,le nîvşeve û bçûke savaye..

Diviya gelek tiştta bejit,le jitirsa xew je sil bit,diviya zû bersiveka wesa bidite ku çi derza nehelit,careka dî tîra tera danite!

Diviya bela we jixwe vekit,da digel giyane xwe dixilweyeka giran da binivit !!

Nizanî de çewa bersiva xwe diti,nizanî de çewa xwe helit bitine...

Divan çirkeyanda,mirov digel kese nahewit,tine digel giyane xwe,gelek cara giyane

mirovî jî bila sere mirovî ye.

Lewra bidengeke pir xem û ture ve gute:

- bese, bes.ez baş dizanim ka çewaye,le de her çim!!

Liser zikî xwe direj kire nav nivîna,Balîfke xwe dana ser sere xwe, da guhen xwe bigirt.

We jî diviya, ve şeve jidest ne det,ter digel biaxivit,ter bibînit,de bu demeke gelek direj,je dûr kevit,dibit eve şeva dawiye bit,wî hemibez biket,dibit edî dîtina wî her ev şeve bit.

ew jî ya peşemane,le we nevet bibite egera mana wî, da çi car ne kete cikî û bejite:

"te ne hêla biçim,da nihu em dixuşiya da bin,te nehêla,heker nihu em dibiheştê da bun"

Lê tinê wê ev şeve ya hey.divêt gelek digel biaxivit,da axivtinên wî diserî da bimînin,divêt gelek lihindav serî rawestit,dibit lixerîbiya wî kes nebit lihindav serî rawestit,wê divêt ev şeve nebite roj,ev şeve çi dawî bu nebin,bila her şev bit,bila her şev bit,lê divêt ew hişiyar bit...!

- heta nihu tu likîve bwî? hemûya pirsiyara te dikirin. ma tu nizanî tijî malate miruvin?Û yên jiber te hatîn,da xatira xwe jite bixwazin,ma xune jiber min hatîne?

Zanî ev şeve,ne şeva nivîstinêye,dibit eve bibite şeva dawiyê wê dibînit,lê dilê sar û mejiyê westiyay,pêdivî nivîstinê bun.wî jî diviya gelek axivtina bêjit,gelek liberamberî landika sava rawestit,wî jî diviya gelek bersiva bu pirsiyarên wê amade bikit

Wî jî diviya heta sipêdê çîrok û hozana bu bixwînit,wî jî diviya ev şeve çi car ne bite roj,wî jî diviya ev şeve ya bê dawî bit ....

Xwe jiser wê teniştê zifirande teniştê dî,û xwe liser zikî jî mt kir,lê her neşya...

liser piştê jî gelek ma,çavên wî zil man bibanê xanî ve. careka dî xwe dibin lihêfa xwe ve veşart,lê her wekû agir dinav wê lihêfê da,wesa jî razî nebu,rast rabu rûnişte ser cihê xwe .

- ez dizanim,lê min hindek hevalên taybet hene,min xatira xwe jiwana dixwast.

"hevalên wî,ewên wan gelek xweşî,pêkive burandîn, ewên wî gelek jigiyane Xwe xweştir viyayn,nihu dê hemûya hêlit,bidûv serê xwe kevit,hevalên wî ewên wan gelek nihênî digel êk heyn,hevalên wî ewên birastî heval "

- vê nîvşevê?!

-erê,min dem nîne,sipêdê zû em dê derbaz bin...!

“ dê derbaz bin, bu kîve? Dê kîve derbaz bin?”

Dibit derbaz bit û êdî wan hevala ne bînit!

Ne ne ,hevalên wî nahêlin biçit, sipêdê dê bêjinê : nabit,tu biçî, mala xwe û hevalên xwe bihêlî .

Dê derbaz bin,dê derbaz bin,derbazbun...

digel peyva derbaz bunê, dilê wê xwe Quta û teZîlanik biser leşî da hate xwar,dû sê rundik ketin ser rûya,lê bilez Veşartin.

giryaya zaroyê bîst şevî,her dû jideriya hizra rizgar kirin, careka dî Xwe havêtine êk, lê day ya bilez bu biçite kurê sava.

- neçê,jê bigere,bila tijî serê min denigê wî bit,dibit êdî min guh liwî dengî Nebit...!

Vê carê birastî giryaya û xwe bihemû hiêza xwe linav sîngê wî da şidand.wek kevalekî Siriyalî xwe ya dikirin .

-hişbe,van gutina ne bêje,tu min dikujî !

-eve rastîe, çun bimiruviye û hatin ne .

Wesa gelek man,her êkî wek xwe xerîbî diserê xwe da hizir dikir .

Girtin,kuştin,geheştin.her dengê zarûy bilind dibu,her şidandina wan zêde dibû ,her wekû mezîqeyeka xemgîn û dû evîndarên jêk dûr diçirkeyeka êkdîtineka dawiyê ...

Dengê derghehî ew kevalê evîniyê bidawî îna.

-hûn nivistîne?Kurê hewe xwe kujt jigiriya .ma hewe ageh jê nîne?

Qutana dilê wan zêdetir bu .lê êk û dû berne dan .

- belê, em dihişyarin.

- pa bu hûn kurê xwe tena nakin?
- ê, yê,, nesaxe....
- min divêt bigirît,bila ewjî bigirît,da ez jê xerîb nebim. eve hêşta hûn ne Nivistîne dayê?

Berî dergeh vebit,wî dergeh bu dayika xwe vekir !

- nivistina çî,em û nivstin jêk xilas.madê jinû em nivin?
- ne dayê bextê te da,xwe mandî neken,da ez ne kevme dixemawe da .
- uxera te xêr bit kurê min,êmanet , tu zû bizifirîte biçûkên xwe,dê xudê Bu me jî qetînit.

tu likêve buy?Miruvên te pirsiyara te dikirin!

Liwelatê rojê,miruvayetiye rolekê serekî dijiyanê da dibînit!

Miruvên te bu te gelek şul û xmeta dîkin.harîkarî,dest girtin,gelek heta xwe Gurî kirinê jî...!

Miruvên wî jikevin da,liser demê gunda bivî rengê karî ra dibun,diher xweşî û ne xweşiyar da, diamade bun, herdem dinêzîkî hevalên xwe,çi cara xwe ne didane paş jibu Xizmetê û sere dana .

eve cend rojekin,mala wan ya pire jîwan hemûyan. divên digel wî bin heta ew derbaz dibit !

Êdî ew jêk xilas,ew xweşî û khîf û seredan û harîkarî, jêk xilas. liwî Welatê ew diçitê,ne heval û ne miruvên wî û ne kes û karên wî lêne.. dê bite êxsîrê xerîbiya,dê Mirada wî ew bit,miruvekê xwe bibînt. evro bu cara dawiyê hindêk dîtin û xatira xwe jê xwast...

- min xatira xwe jihevala dixwast.
- dê bila lawê min,bu xwe bêhnekê binive, rêyate dûre.



Nivîstin,hê hê,dayika wî nizanit ku eve demeke ,ew jî jinivistinê sil bwî,eve demeke,Wî tama nivistinê ne kirê, ew nizanit binivit,wî nivistin ya jibîrkirî,ew jî nizanit bu? Jiber çiyê ?erê jikefya?yan jirtisa ye?Bersiva vê pirsiyarê ,ew jî nizanit!!

Dêmê dayika wî,çavên wê gelek jixewê xerîb bibun. gelek lipêş çavên wî ya lawaz û bêhêz bû.

destê xwe liser stuyê wê ra bir û da ber sîngê xwe û beref dergheî bir û gutê :

- divêt tu jî binivî,tu jimin pitir pêdivî nivistinêy,e z hîvî dikem ev ^tê min kirî,Gelek hewe newasitînit û nebite egera nexweşiya bu hewe.Mirada min jivê çendê harîkariya heweye,da pitir ez xizmeta hewe bikim,û paşerojeka baştir bu me hemûya hebt .

-em nabine asteng dirêya paşeroja te da , uxera te xêr bit ...

Giriyê ser jiaxivtina wê stand .

hêştê dergê baş lidûv dayika xwe ne girtî,kurê sava bêdeng kirin û careka dî xwe havêtine êk .

-eve şeva min bu,diviya ba tu ne derketibay!

Jin linik me çend diasêne?!

Libajêrê kiyêf,dû sê bikupekê birêne ...

"te kîşik divêt?ewa pirç zer yan ewa pirça wê wek pirça jinkên me?!

- ne,ne min ewa pirç zer divêt,da tama wê jî bizanim!"

- cuna min ya fer bu,tu dizanî kesê bawer ne dikir ku ez dê subhî çim?! Digutin,eve çend salin tu dibêjî dê van ruja çim !

- tu dê çî û min hêlî?!

- te jin liwelatê xwe heye?

- ne xêr, ez yê bê jinim !

-ha, jiber hindê çi nemaye dê min xwî?!

-heker ez te bixum,ma dê êk lumey min kit?Nê tu wek pişikay!!

-ewa berî min te çewa didît??

"ma êk bu ma deh bun!Nê hijmara wan naête bîra min, ya buye berîkanê,di nav meda,kakî Dê pitira girt!! "

- ne,ez te nahêlim,hemû çend heyvekin,dê zivirme te û em dê pêkve jîn wek jiyana miruva dibiheştê da û biçûkên me dê bu xwe bine wec .

carekadî giriya zaroyê sava kernevalê evîniyê têkda. Vê carê dayik zûtir litana wî cu,jitirsa ku dîsan kes dergehê liwan ne qutit

- tu dizanî ku eve cara êkêye ez karekê hinde mezin dikem,û ez yê peşêman ?Peşêmaniyê dilê min xwar, ^ê min xwar,tasar îna min.roj bu rojê ez yê pitir

Peşêman dibim,û roja çuna min ya nêzîk dibit.

ez çi bikem? Wek hevirkiyekê dinavbera Dilê peşêman û dilê liehîviya jiyaneke pir xweşî û tenay!!

- Mamê te digut,bu wî şerme,bûka salê û biçûkê bîst rojî lidûv xwe Bhêlit,û mala têr mêvan û babê pîremêr dayika nesax,dê bu kê hêlit?û bidûv serê Xwe kevit?

Ma eve şula wiye?

-heware !ez çi bikem? Biçim? Ne çim? ez mirim,dû dilyê ez kujtim,ez xwarim,peşêmaniyê ez sutim.

dê her çim,dê her vê şerbetê vexum.lê dê çewa Xatira xwe jibabê dil mezin û pir kuan?Yan jidayika dilsuz û dil sutî xwazim?!

Xwezî hema ew jî biba xewin û ez jê hişyar ne bame !!

hiêştta kabiray telefuna xwe bidawî ne înay, derê kabîne lê vekir û xwe havête dinavda û ew qefta rojnama dana bin serê xwe û xwe kire qurmik, karê xewê kir .

Xew? Xew jî ya sipî buy, zikê birisî, dilê jar, ^ê lawaz, hizirên belav, Xew revandin ...

Çend carekê êkê wek wî yan jiwî xirabtir diviya cihê wî jê bistînit, lê dixurî:

-eve malamne eve jora mine, ya buye jora min!!

Jora wan ya bûçke, ji her dû jorên dî vedere , her wekû bu wan dirust kirî .

eve jora birayê mezin bû, bu dilê xwe avakirbû. ciwan bûyax û khereb û ser û ber .

Lê cihê daxêye têve ne bu zava, xêr jê ne dît, cu bidiniyayê ket, şures û derbederî. heta berî çend saleka jî binavê wî bu:

- eve jora ... ye ,

- here jora ... .

ew cend sal bun ew lê dinivist û bibu jora wî, lê her binavê birayê mezin bu.

Care kê dayika wan gut:

- mala minê, eve jora wî bu têda ne bu zava, xudê dizanit ka libin kîş kevirî buye zava? û ka kê bu khîv û xena kirîe ? hê hê .eve diwazde salin me ne dîtî ...

Piştî hingê hemûya wek biriyarekê dan û binavê birayê biçûktir kirin!

Ka ev gutine dê heta kengî mînin?Û dê binavê birayê jiwî jî biçûktir kin.jiyan huye!!

yê liber perên esmana,û her yê bilind dibit,û dibin da erd yê buye bizutekê agirî,û xelik yê bu xwe direvin,kes nizanit ka dê kîve çit?!

her perên çengên wî yên diwestyên,her yê hewil didit xwe ragirt,da ne kevtê dinav wê gola agirî da.

bidûv ve,dayika wî,babê wî, her hevit xûşik û çar bira, Mam û psmam û hemû mirovên wî,dikin hewar gazî:

- ne fire ..me ne hêle..me ne hêle ...

her agir zêde dibû,her bê hêz dibû,lidawiya wan,hindek bune alfê agirî.

Babê wî berze bu,dayika wî ne diyare.her yê bêhêz dibit.

Berî agir landika zaroyê wî yê sava dinav pêlên xwe da berze biket,seruser xwe havêtê:

- ne...ne ...

Wekû dîna,rast rabu ser xwe.

- bisimila,bisimila,te xêre?Dîsa xewin bu?

-erê , erê, dîsa her ew xewina kirêt bu ...

- navê xudê bîne,hindek ayeta bixweve bixûne.eve hindî tu hizra cunê dikî lewra.

Çi nemaye dê bite sipêde,bu xwe bêhnekê binive . hêšta serê wî Balîfk gerim ne kirî,hizira berze kir.

Lê car jiber recifka ^ê wî û car jiber giriya zaroyê sava. ageh jixwe dibû.

Careka dî dinav ewrên xewê da berze dibû,lê dengê qutana dergheî hemû tişt bidawî înan:

-hilun, direnge..

-hilun,mafiya em girtin!

- kes çî livîna ne ket!Destên xwe bilind biken û ka hewe çî heye bînine derê! Berê hindêk çequ û demancekê yên dayne sîngê wan.

Biser û çavên veşartî ve .

Berûk û paxlên wan vala kirin û derê jora wan jipiştve girtin û berze bun .

Destê xwe dibin lihêfa wî ra îna ser sîngê wî,û beref royê wî bir,diviya bizanî ka yê hişyare?

Berî qutana derghey,hişyar bibu,lê diviya hêştta binivit.

- tu yê hişyarî?

-ez her ne nivisitîme .

- divêt tu karê xwe bikî,direnge .

ew nivînên gerim,bu bibun çeperekê asê,nediviya jê derkevit .

her tasar liser zal dibû,her peşêmaniya wî dijwar dibû. hindî dem nêzîk dibû,diket beramberî wê rastya tal .

her dem jiberamberiyê ditirsya,direvî,ne diviya kesê bêhêz bibînit,taybet heker berî wî demî jiwî bihêztir ba!!

Beref wê dêra her roj lê mêvan çû,da evirojî zikê pirsî razî biket.

Dîsa ew qeşe yê hercar,û licihê her car,lihîviya wî bu .

Dê vê carê çî bêjitê?Dê çewa şê jê burte cihê xwarinê?

tu bu kar nakey?Ma dê heta kengî hu mînî?hêştta tu yê gencî,divêt tu xwe ne kiye

êxsirê dermanik u meyê

Ma lihîviya çirkeyekê ku mijûl bit, yan jî çih biçit, lê heker jî çih ne cû? heker ma lihîviya Wî? Divêt her eviro jî tiştê bixut. ne vêt liwêlatekê hosa jî pirsê bimirt!

Babê wî yê rûniştîye, piştî xwe ya daye dîwarî, serê wî yê dinaf kîskê tûtinê da^ştî ewa dinav lêvara ya binîviye , yê cigareka dî dibêçit.

tizbiyên wî dizendikê da şurbûyne xwarê, hizira yê birê binê deriyayeka kûr.

yê berperên jiyana xwe ligunda, xweşî û nexweşî, şureş û talan, pîrs û tîrs û nesaxî, zivistan û havîna, ve didit ...!

"gundê wan, pitir jî bîst mala ne , hemû mirovên êk bun, libinê çiyay, dûr jî rêk û ava, bê kareb û nexuşxane û xwandîgeh, jî aneka gelek asê û giran ....

hejariya xwe bişivan û gavaniyê ve , hind jî bimirêbatiya axayekê dil req ve burand ...

Tinê wî şiyaye korên xwe bihinêrte xwandîgehê.

gelek rojên zivistan û serma, biçûkên xwe likerî siwar dikirin û dibirine gundê fela xwandîgehê .

gelek şeva heta sipêdê dirûne kirî, gelek roja heta lê buye şev şixire kêşayne, gelek zivistana gerim ne dîtiye, gelek şeva birisî nivîstîye, gelek buye mêvanê girtîxanê, şureş û derbederî û talan û gund sotin, tûp û firoke herdem hevalên wî bun...

Gundê wan dinavbera nal û bizmaran da bu .

her demê deng jî devê tupekê dihat, gundê wan dihate sutin.

Piştî şiyay liser dêwê hejariyê zal bit. dêwê pîratiyê liser zal bu ...

pîratî jî nesaxiyê mêvan dîkit.

Piştî eve hemU kirîn U bçUkên xwe kirîn wec . çi wec linik wî nema .

JinU dê wî bu dêwê pîratiyê U nesaxiyê hêlin.dê hosa wan qenciya liser xwe rakin!eve dawiya xebata wî bu?

Berperên jiyana wî ya şêlî,her şêlîtir dibu,gelek cara çi diyar ne dikirin.

demê dayika wî dengê xwe bilind dikir,U gazinde dikirin, wek dayika zavay,mayê xwe dihemû tiştê dikir.

car jî wek babê wî xwe damay û pusîde dikir,lê gelek wesa na mînit û Care kadî geriyanekê dibit nav jinka, ewên gelek mijûl bidirust kirina xwarinê ve .

Hewşa bicûk yapire jimirovan,hindek cara dengê keniya wan tulazên jiwan wêve ,ew Dîmenê xemgîn bigiyan dikir,lê carekadî şerim dikirin,dengê xwe nizim dikirin.

herwekû yên liser mezarê pîremêrekê gelek xweştivî û zana,ha ha dê bin ax ken.Nevên liser mezarê wî bigirîn da guneh bu wî ne ên û ne vên jixema wî da bikeyv bin.

Vêca ew jî yên mayne heyrî,lê dengê keniya biçûka û giriya wan,hindek cara ew kumbun Pir bizav dikir....!

Wek şerkerekê birîndar,dîçeperê xwe da maye asê. diviya biçite derê,lê neşiya .her demjimêr ya dibezit,û her yê xwe mijûl dicit:

- tu dizanî eve hemû yên lihîviya te?û te ci dem nemaye?

-erê ez dizanim !madê çewa xwe havême nav van mirovan?Dê çi bêjime wan?Dê çewa digel wan axivim?

Berî axivtina xwe bidawî bînit,wê dergeh vekir û mlê wî girt û gutê:

-eha husa!Madê te xun?her ew mirovin,ewên rojê deh cara te didîtin!

Jiçeperê wi yê asê ina derê .

beramberî wan seruçava,wan rondika.beramberî Babê lipêş çavên wî wek çiyay bu,nihu wesa ne maye.gelek û gelek yê bêhêz buy.

hêşta silav ne kirî,gelek denga pêkive gutin:

- sipêde baş . her wekû te inyet nîne biçî?yan destên te jibiçûka na êne berdan? hindek jipêşve rabun,chên xwe bu vala kirin .

Wî diviya birex babê xwe ve rûnit .berî ew jî jipêşve rabit.destê xwe dana ser milê wî û pêkve rûniştin .

Hemû bê deng bun,çavên wan man lidevê wî.herwe kû kes livê hewşê ne !

Diviya êk baxivit,bikenit,yan jî dengê giriya biçûkekî, keniya wî ! her we kû dayikên wan destên xwe bidevîve naysn,hemû bêdeng man.

- keremkin,xwarin amadeye .

eve bu xweş dergeh,milê babê xwe girt û gutê:

- kere mike bab,da biçin xwarinê bixun .

-ez naxum .dilê min naçitê .hema hûn herin bixun.

Berî biaxivit,daykawî gutê:

-hilu,tu jî parîekî bixwe jiber mêvana şerme,bila kurik biçite ser uxeraxwe bêy dilman.

hindekên dî jî wesa gazinde jê kirin.

hemû pêkve rûniştin rexên xwarina amade kirî .

Dengekî gut:



- bixu bira êdi tu van xwarina na xwi,dê xwarina qudika û ya jimare liser xwi,dê jinanê me û pêxwarinên me xerîb bî.

Dengekî dî gut:

- qet bawer neke hemî tişt yê liwara heyn û yê xweştir jiyana wan û xwarina wan lidûv pêfketina wane,ew bu çi tiştê pêdivî me nabin,heta bu xwarinê jî .

Axivtin bu ger û dur,hindeka diber hevalê xwera diaxivit û her kes wek dîtina xwe,yan jizar devê êkê dî,wek kumbuneka ne rêkxistî lê hat.

her kesê wek xwe ewropa didît,wek hizira xwe jiyana wan hizir fikir,hemûya Mirad bu vê şerbetê vexun .

- xudê zêde ket .

-erê willa me gelek xwar .

- direnge,divêt em zû bidine rê .

hemû man lihewşê, û di hizira da man hilawîstî.wî qesta jora xwe kir.

Dîsan kete beramberî landika sava û bûka salê,dîsan hembêz kirneka dirêj,her demjimêr yê dibezit .

liçend çirkên dawiyê .simku rabu ser piya û çantkê xwe havête milê xwe û biçavên pir rondik :

- bixatira te .

her wekû şîrek liserî day,ser lê birî !

Neşya bersiva wî bidet,neşya jipêşve rabit .her hişik ma liser darê landikê,girî jê ne hat....

Simku dû maç lirûyê biçûkê xwe dan û der ket hewşê...

Liwê hewşa berfireh û sîmkirî,gelek rengên mirova, gelek bîr û buçunên cuda.têkel bûne,lê têkelya wan gelek cara dijwar dibit,hestên nazik disujit!

Hewş her ya teng dibit û her mêvan yên zêde dibin.

ew hewşa lidemekî ne jimêje cihê rahênan û fêkirina leşkerî bu, cihê leşkerâ mezntirîn hêza cîhanî bu.

gelek tevin livê hewşê hatîne raçandin.

Hê hê,new buye girtîxaneka bê dergeh,penaber xemên xwe lê bin ax dikin,gelek cara serê xwe jî gurî wan xema diken!

Cih nemaye penaber xûna xwe digel xuha xwe têkel bikit û gurî paşerojeka geş biket!

Simku liwek bilindahiyekê rawestiya,heval û biradera dest havête xatirxwastinê .

her ma lihîviya dayika xwe,ka dê çewa xatira xwe jê xwazit?!

Wek rêzika mêriya,êk biêk hatin û burîn . nezanî ka eve kîne? Û ka çi dibêjin?

her yê peşêman dibit,lihîviya dayika xwe,babê xwe, Mamê xwe,yan her kesek,her biçûkek.bêjitê,neçe,neçe divêt tu neçî,em nahêlin tu biçî ...

Kesê ew mêranî jê nehat û bu kul û ma didilî da.! hemûya diviya jivî agirî qurtal bibit,bila ew her dinavda bin,wan diviya bighte xuşiya,bila bu wan her nexuş bit!

-here,tujî xwe qurtal bike ,her kesê jivî agirî derket, herwekû jinû jidayika xwe buy..

Suz dabu,her demê babê wî ,yan dayika wî yan her kesê nêzîkî wî jidil bêjitê neçe,Bizivire .

bzivirt,heker serê wî tê biçit,û heker liser lêva uxera xwe bit,her rojeka welatê mirovî,dinyayê bihemû xweşya wê ve diînt.

Lê sed qeda biçerxa felekê bikevin.dibit lidawiyê dayika wî yan babê wî,bêjitê neçe,me nehêle .

da jihemû dilê xwe bikite hewar û bêjit:

-ez naçim ...ez welatê xwe nahêlim.ez dayik û babên xwe nahêlim .bla bu min nexuş bit.ez jî wek hemûya dixuşî û nexuşya da..

Nîveka parên xwe kirine xêr,her gaveka neçte vê uxerê, her gaveka êk bêjitê neçe...

ev phîve ma û guh lê ne bu,her ma lihîviyê bidilekê pir hîvî , dê her guh lê bit ,Dayika wî dê her bêjit.

ne,ne, babê wî berî wê dê bêjit .diviyaba jinka wî ev peyve gelek cara gutba ,wê jî divêt bighete xuşya, bighete biheştê.her ma û her destê wî yê diête hejandin û rûyên wî diêne maç kirin :

- uxerate xêr bit .

- bixêr biçî, zû bizivirî biçûkên xwe .

-hişyarî xwe be .

Lê hizira wî ma lidayika wî,babê wî,ka dê çewa liberamberî wan rawestit ?Dê çewa xatira xwe jiwan xwazit? Dê çi bêjitê? Dê çewa razî ket? Dê çewa jinav destên dayika xwe derkevit?

hêşta hizir yên serî lê dihêrin.hind dît yê dinav sîngê dayika xwe da û biherdû desta stwyê wî ya dişidînit û bidilekî pir kuan ya digirît..

eve jimêjeye,ne giriyaye .rondikên wî gelek digirim bun,royên wî disutin .

Dayika wî diviya gelek wesa bimînit .divya çarekadî sîngê xwe bu veket û şîre xwe bidadê,diviya jiaxê bilind bikete ber dilê xwe,diviya layê layê bu bêjit!

Babê wî gelek yê bilez bu,da gera wî bêt,her destê xwe limilê dayika wî dida,da ew bête cihê wê,lê dayika wî ji hay çu bu .xwe bisîngê wî ve dişidand,û her babê wî destên xwe yên amade kirîn,her yê xwe nêzîk dikit,lê dayika wî berne da....

Simku jî nediviya wî ber dit .bêhna babê wî teng bû, hema xwe havête herduwa pêkive her sê wek êk mirov lêhatin.rondikên wan têkel bun,qutana dilên wan bune Êk,ewên lirex ûrûyên wan,wek bînerên şanugeryeka tiracîdî,bu rundik barandin .

Gelek wesa man,gelek bîrhatin înane bîra xwe .

xuşî,ne xuşî,rev,aware,şer,Şureş,birs,tirs,hejarî û maldarî ...

Jibiçûkatiya wî,hemû wek kasêteka tumarkirî diserî da xweya dikir.

Babê wî wek hevalemê nêzîk bu,wek hevalemê hevjiyê wî bu .çicar wek bab xwe bu wan diyar ne dikir.herdem wek heval beşdarî dixuşî û ne xuşîya wanda dikir .

herdem rê bu wan xuş dikir,da ew bixûnin .

kar biken,serferaz bin,têpare bin .

Xwe dikire gurî her ^tê dixizmeta wan da ba.

herdem yê bikeyf û dil xuş bu,bidil xuşîya wan .

berî wan nexuş dibu bunexuşîya wan.

hevalînî û nêzîkya wan gheşte pileyeka gelek bilind. heval û biradera Behis dikirin.

babê wî,ewê wî gelek viyay,nihu dê hêlit bu nexuşya,bu pîratîyê,Bu kul û kuvana.nihu dê kite gurî berjewendiya xwe ya taybet,dê kite qurban,bu xuşya xwe .

ewa hinde sala kirî,û hinde mezin kirî.

ew hemû jibîr kir.lipişt xweve hêlan.

Çi biha bu ne dana,nihu ,piştî çend çirkeyeka,dê ew mandîbun û xizmeta dişer ne xuşya da,dibirs û tirsê da, dişev û roja da.dê gurî jyana xwe kit.

kî dibêjit dê ew jiyan ya xuş bit?Kî dibêjit dê xêrê bînit? Kî dibêjit dê gerdena wî aza kit?

Çend çirkene,dê wan hîviya û wê hevalîniyê û wî nanê bêkive xwarîn jibir keit !çend çirkene,dê bite xewin û berze bit !çend çirkene,dê dubare xemên babê xwe zêde kit.çend çirkene,dê bite kuleka dî didilê babê xwe da...

Çend,çirkene û her çik,çik,çik,çik.

dem hijmêra bêwijda , ya bilez bû.

hindek denga jêk vekirin û gutin:

- direnge,rêka wî dûre .

Çavên wî û yên babê wî ketin beramberî êk.eve çara êkêye,dibînit,babê wî digirît û rundik jiçavên wî diêne xwar.hindî dîtî,her yê serbilind û keyf xuş û biumêd buye.vêçarê ne ew miruve,ne ew keyv û ne ew axivtin. her pusîde û damay.Çar jî serê xwe dihejand û di ut:

- dê ew bit ya xudê viyay, uxerate xêr bit.

ev gutine,ne jidil digutin,lê piştî wê rûana berî çend rojeka roday,ku pitir jised kesa têda hatîn kuştin,jiblî birîndaran,jiegera peqîna turimbêleka barutê .

Jiwê rdjê her wî digut û dubare dikir:

-herin,bila hûn lipêş çavên min ne êne kuştin .

Lisipêdeyekê piştî jinivêj û sineta xilas buy gute kurê xwe :

- kurê min,heker te hêšta niyeta derê hebit?eve min destûr date...

Mirada simku ya çend salan nû kir .lewra jidil biriyara xwe da

Berî çend saleka,berî serhildanê,her tulazekê pirsiyar jê hatiba kirin û gûtbayê:

- te çi hîvî û umêd hene?

Da bersiva wî ya bilez û serekî:

- welatekê azad..

Û paşî da bêjit:

- jineka ciwan..parekê baş...

Car jî digut:

- xwandna bilind û geriyan liewrupa...

heker nihu,piştî serhildanê,ev pirsiyare biête kirin.

dê bersiva tulaza ya êkê,çuna jiderve bit llhemûya divêt jivê zivirukê derkevin,kesê ageh jiwelatê azad nemaye | Kesê ageh jijineka ciwan nemaye|Kesê ageh jixwandinê û pare û maldaryê nemayell

her hîvî ewe ku birevin,xwe jiberpirsiyaryê dûr biken, xwe jibin barê giranê welat û şureşê û...

bînine der,her kesê ageh jixwe bitinê heye .her kesê liberê xwe ye .hîviya serekî nema,armanca civakî berze bu,dujminê serekî hate jibîr kirin,herkesê jibihayê nanê rojane pitir şol biket,dê bu kirîna paspurteka sexte Kum ketl

her kesê xanîek,turimbêlek, parçeka zêrî ,rezek hebit. îna berfirutinê û kire dipaxla rêberekî da û xwe xilas kir.

eve demekê gelek dirêje, înyeta xwe kirbûll

Lê suz dabu,ne çit,heta babê wî û dayika wî razî ne bin.

Birazî buna wan,carekadî karê xwe kir û xwe amade kir û parên xwe kum kirin û hevaley bu xwe dît,û dem û roj diyar kirin.dîsan hîviya xwe dê bicih înit...

Liber dîwarê wî baxçê xemlandî.simku diviya gelek rawestit,piştî çend kargeh û cihên

şulî du sê cari têkvedayn û bê hivi km...

" - bibure ez yê lişolî digirim ?

- şol ?! Şo^ çî ? Ma hewe şolek livî welatî hêlaye?!

- sipêde baş.

-ha,te çî divêt?

- bibure ,ez yê lişolî digirim..

- şol, şol nine .û livan nêzîkiya jî ne mîne..

-erê dê şol linik hewe peyda bit?

--heker hebit jî nebu te l "

Çavên wan mêvana leşê wî dixwar, wan ne diviya seru berê wî bibîninl

Wî diviya bêhin kete wan gul û gulçûçeka, diviya liser wê rêya dinav gulara diçit .biêt û biçit .hindek hozana, romanekê bixûnit ,lê ne hozanin û ne romanin .diviya liser wî textê darî rûnit û bêhna xwe vedit .lê cihê wî ne bu, diviya gelek liber wî dîwarî bimînit,û tijî çavên xwe dîmenên çivan bikit...

hind dît dû pulîsa milên wî girtin U kêşa di turimbêla xwe da û jiwî cihê dûr kirin.

Wî diviya gelek lihewşê da bimînit,tijî gohên xwe dengê wan mirova biket,Çavên xwe jidîmenê dîwar û jorên nav hewşê da têr bikit,baş berê xwe bidite wê darhinara, eve çend sale wek xweye,ne mezin dibit,ne hişik dibit,, babê wî digut:

-eve wek şoreşa meye,her ya şîne û çî berhem nîne ..

Wî diviya destê xwe pavête çeqê wê mêwa tirî, ewa gelek geş û berê wê qet naxun.

„ dayika wî dibêjit:

- cîran mêwa me çavîn dikin..şîn û geş dibit û dema biser dîwarê hewşê dikevit,Di sujî û hişik dibit û tiriye wê pûç dibit...

Wî diviya çend careka lişûn pêt xwe bêt û biçit.

ewên wek rêka kadiza liser çîmentuyê diyar dikirin.

çend carekê êkî didît digut:

-eve çiyê wesa sipî buy?

Hemû pêkve dikenîn û digutin:

-eve şûn pêt simkune hindî liser hatiye û cuye,renge xwe gohartiye..,

Wî diviya carekadî,romanekê yan qefteka hozana liser wê rêkê bixûnit,lê her hevala radikêfa beref turimbêla amade.



Liber derê hewşê, bu çara dawyê liser milê xwe yê çepê zifirî, da têr berê xwe bidite

kulkê mmşka û yê pezi. ewên babê wi bu dilê xwe ava kirin .

Tijî divinên wî bêhna ziblî bun, lê vê carê bu nexuş ne bu wek carên dî, wî diviya têr liberamberî herdû kulka rawestit. yariya digel dîklê sûr û berxê sipî bikît !

hind dît turimbêla wan wek ya bûkê birê ket û yê dinîva dû hevalan da û berev berze bunê diçin ...

- heker hevalê min ne hatiba, nihu ez da limala xwe bim, linav biçûkên xwe bim!! heker ewî gutiba ez naçim. ez jî ne dihatim .

Ne ne , ez da her êm, heker roja dawyê ba jijiya min. da her vê îtime serê xwe ..

Ne , heker ew ne hatiba, mirovên min ne dihêla ez bitinê biçim !

Nihu da linav biçûkên xwe bim, linav hevalên xwe bim, liwelatê xwe bim .

eve hemû jegera wî jivana bêuxer bu ..

heker ew jivan bicih ne hatiba , heker ew jivan neba, heker ne hatiba!

Lichê simku jivan hey digel hevalê xwe, liberamberî dikana wî, ewa nîvbha firotî. Gelek gîro bun.

"eve cihê şo^ min bu, eve hemû hevalên min bun. min hêlan û beref dawyeka nediyar."

Gelek man lihîviya hevalê xwe, lidûv jivana wan nehat. wî diviya êkcar neêt, yan piştî çendekê bêt û bêjit:

-bira limin bibure ez naêm, min biriyar da ku ez mala xwe ne hêlim."

Da gelek keyva wî êt,da bu wî jî bite hêcet.

"-ez da çim,lê hevalê min nehat,rêka husa bitinê ya ne xuşe ,ez jî naçim." her hîvî dixwastin ku hevalê wî ne êt,lê dengekê gut:

-eve hat!

Devê wî yê bikeniyê ,her jidûrve gut:

- sipêde baş,biburin ez gîro bum,dê keremkin da biçin. ew hîvî û ew dervet jî lê kujit! !

Beref mala babê hevalê xwe çun,da ew jî xatira xwe jê bixazit.

hevalê wî şêrku xudan mal û bçûke,û yê cudaye jibabê xwe.bçûkên xwe hêlane bitinê û beref xerîbiya çû. xemên wî hêşta girantirin!!

Licade û kulanên bajêrî,wek hêbetiya ma,her wekû eve cara êkêye,vî bajêrî dibînit.

Çi tam û xuşî jivê geriyane na êt,her vê gavê wek xerîba lê hatin,lê xwe asê kirin ,Viyana wê ne hêlan,didilê xwe da digot:

-ez ne gerîle me,ez ne seyrangerim,ez xudanê te me ,ez xudanê vî welatî me.raste dê nihu hêlim,lê bu demekê kurt .dê her zifirim .dê her livî welatî kelexê xwe bin ax kim...

Nihu ,dibit babê şêrku nehêlit ew biçit,nihêlit welatê xwe û mala xwe gurî berjewendiya xwe biket .

dibit babê wî bêjite wan neçin,ez nahêlim hûn biçin!

Da ew jî bihemû dengê xwe bikete hewar û bêjit:

-em naçin em mala xwe û welatê xwe nahêlin .

hêşta yê lihîviya wê hîviya mezin,ew hêşta bê hîvî ne buye.dibit ew hîvî nihu bicih bêt!

Nihu,gera wiye .ew dê kefte beramberî babê xwe .

ka dê çi bêjitê?Ka dê çewa razî kit?Ka dê çi şanagerî rû dit?

Liber wî derghê ew lê rawestiyayn,û liwê berê sipêdê, hindek biçûka yarî dikirin.biçavên şerim û hejarî,berê xwe didane wan.

her wekû wan biçûka dizanî ku ew dê karekê mezin kin, dê jiqada xebatê revn. eve şêrku çû jor û ew ma lihîviya wî.ka dê çi rû dit? Kadê çend gîru bit?

Diçend çirkeyên gîrobuna wî da,tama jiyane xuştir dibu.

Wek mirovê lihîviya sêdarê .ha ha dê werîsê zivir êxine stwyê wî.ha ha dê patê reş êxne çavên wî.

ha ha,dê kelexê wî mînite hilawîstî û sar bit.ha ha dê.ha ha dê .. ne ne ,ha ha dê babê wî bêjitê ne çe!!!

Ew yê jivê tengavyê rizgar buy,nihu gera hevalê wiye. ka ew dê çewa xatira xwe jibabê xwe xwazit?

Ka dê bêjitê neçe?Ka dê çewa jivî deravî rizgar bit?

Piştî demekî, şêrku jimala babê xwe derket û gut:

- da biçin, ez amade me !!

Çavên wî tijî xem û xerîbî bibun,lê nediviya xwe diyar bikit!!

Livêre jî hîviyeka wî mir,kesê ne gotê neçe!!

Çavên wî jivan bazar û xaniya venabin,her wekû eve ne ew bajêre ewê jiyana xwe lê burandî .

wî divêt ciwaniya wî digel xwe bibit,lê piştî çend çirkeyeka,jinav pêlên bajêrî derketin û beref xabûrî

ev rûbarê dinav bajêrê me ra diburit,wek xaburiye !

her çende mirov hest dikit ku pêlên wî germatiya pêlên xabûrî nadit!

Pêhna min pê naêt,kirmê min pê namirt!

Wan çend demjimêrên ez liber lêva wî diburînim. dideftera rojanên xwe da na nivêsim,çunkû xoha westiyana şolî jimin zioha nakit.

herwekû ne rûbar,mixabin ku min kiriye beramberî xabûrî!

Ka hirêna pêlên xabûrî?Û ka sar û sistiya pêlên pir gilêfên vî rûbarikî?

Xabûr ya buye meydana leşkerî,her wekû eve çend salin vêrê çihê fêrkin û hatu çûya leşkerî ye !

Leşkerê dewleta turka,dîsan liser tuxîbî kum bune. yê n xwe amade dikin jibu hêrişeka gelek mezin.

her çend heyveka eve karê wane,leşkerê turka xweyaye,dijwartirîn û bêdiltirîn leşkere liser rûyê duniyayê .

ne dîne û ne wijdan.ne tirse û ne şerim .

her ^tê diderheqa vî milletî da biken,bu wan serketine û nave .

Wek gurgên har,berbûne nav vî milletî .ter û hişk pêkve disotin.

ev destkevta vî milletî bu wan ne xuşej ne dirazîne, wan nevêt kurd bibine xudan desthelat û wec .

wan nevêt tenahî û aramî û avedan divî welatî da hebit. nevêt kurda hosa bibînîn,lewra bihemû hêz û şiyana xwe kar,dikin jibu têkdan û nehêlana vê destkevtê.

Kurda jî ageh jivê çendê nîne?!Yan bu gelek jivan ne xeme?!

her kesê bişêt birevit,texsîr naket!Para çavên geleka tarî kirîne,kursîka pêt geleka qeyd kirîne ,ewên çi jê ne êt,dê rev jê êt.lê geleka rev jî pêçê nabit.Dibin Alivê agirê şera.

eve ew jî ketine ser rêya revê. kes divan rojên tengav da jimala xwe dernakevit, hemû lihîviya wan bun:

-hûn hatin? em lihîviya we ne. dê paspurtên xwe amadekin û herin şo^n xwe dirist bikin lidaêra asayşê û darên dî...

Paspurt! Paspurt çi paspurte .hemû dizanin ku ya sexteye ,hemû dizanin ka çewa hatiye dirûst kirin!

Liser vê hemûyê ra, liçend dewleta dimeşt û vîzayê didinê, lê her wekû lihêrwînê digerin, wesa liberperên wê digerin.

herdû gelek hatin û çun, gelek gîru bun, jiber destûdarê deverê, mêvanên tuxîbî gelek in, her wekû rojên şerê cîhanî. leşkerê turka wek rîzika mîriya beref Kurdistanê diçin.

peyade, tanik, tup, firuke ....

eve karê wane lihemû bihara û liher demê wan viyay, hosa û diwartir welatê wan kirêt dîkin, bêy destûr û tirs.

Wan nevêt tenay û avedanî bikevte dinav vî milletî da, wan jî eger hene bivê çendê!

her hêcetek hebit, bu wan dibite eger, bu pêşel kirina dest û darê herêmê. çi cudahiya nêkin dinavbera şerkerî û xelkê bê guneh .lihemû rexa kuştine....

Wesa diyare vê carê jîcarên dî dijwar tire!

Lê liwelatê bîrsê hemû tişt bipare ye!

Ji axa welatê xwe bipare derbaz bun! eve cara êkêye simku û şerku ji welatê xwe derdikevin.

her çende ew jî welatê wane. lê bêhna biyanyê jê dêt.

Simku gelek cara diviya lipişt xwe bizifirt, lê lekûlumên hevalê wî qaeym dîkir.

- ger tu çuye rêyekê lipişt xwe ne zifire!!

Beramberî rastiyeke mezin bun.xerîbî û dûrketin jimala xwe û kesûkarên xwe .

Likuntirula turka jibilî tirs bê bawerî û eniyên girê û liwlyên kilaşînkufa.

dîsan lê geriyan û pirsiyar kirin û rûskirin,herçende ,eve ne ^tekê seyr bû, bu wan,lê vê carê jihemû carên dî dijwar tir bun,lirexê Kurdistanê û lirexê turka jî.Dever hemû bibu devereke leşkerî,hemû kar û bar didestê leşkerî da bûn .

Lêgeryan û pirsiyar kirin gelek didijwar bûn. taybet bu wan kesên wek wan,ku jiKurdistanê ne !

Çi kun û qulaç neman,dû sê carî lê ne geriyayn!

- dê cend mînê liturkiya? hewe çi kes û kar hene liturkiya û liKurdistanê?

hewe çend pare hene?Çi tişt digel hewe hene?Wek kitêb û rujname û ^tên nivêsinê?Kasê û wêne û ....??

her nivêsinêka bikurdî,her rujnameyek,kuvarek, wêneyekê kurdî bu wan dujmin bu.

Liser bê baweryê ra,paspurta sexte û bitirs! Pitir dilê wan lez dikir.ptir xûna wan har dibu,kerb zêde dibu, her bawerî kê m dibu .lêgeriyan û pirsiyarkirin zêde dibun.

Û eve hemû birêka ziman zanekî dihatine kirin ku her xelkê welatê wan bu.

Nîva giyanê wan çu heta lê buye êvar,jikuntirula turkiya derketin û berev bêdawiyê.

Lê kengî jiyana wan,dawiyeka diyar hebuye?Kengî paşeroja wan ya diyar bu?

her dem dinav Şer û nexuşiya,her dem hejarî û birs bara wane. ewên jiber tub û firuka rizgar bûn,ketin tura êş û ne xuşiya.ewên mayin ,wek evdala çi jê naên,tinê revîn.

Lê revin ji hindeka pê çê nabit

Ber lichê xwe biqîmetelew pila xwandinê,ew zanîn,ew mirovayetî. hemû dimînit dicihda.Demê mirov welatê xwe dihêlit.

mirov dibite amîret.dibite çine.lipêş çavên xelkî reş diyar dikit.

ew rêya hinda dirêj min birî,ew hinde qonaxên asê,ez derbaz buyim,hinde rê hatîm,

lidûv serê xwe ketîm,nihu bê dawî û bê hîvî,bê kes û heval,ew rojên asê û ew şevên dirêj,min hemû bu çi liser xwe qebûl kirin?!Ji bu çi?!

her jiqunaxa êkê,ez yê peşêman bum,diviyaba min biriyara xwe bidiristî daba,her jisilupî ez zivirîbam.

silupî,silupî,welatê min...ax,xwezî nihu ez jisilupî berev mala xwe çubam,wekû xelkekê

Qunaxa wan ya êkê jidervey welatî,silupî bu...

Gelek man lihîviya pasa ku dicite stembulê.gelek pêhna xwe vedan,xwarin û vexwarin.hindek heval bu wa çêbun .piştî pilêtên pasê birîn,çendekê linav bajêrê silupî Geriyan,her çende silupî çend bihusteka jituxybî dûre,lê faşista şiyaye gelek rewşt û tîtalên xwe lê biçînit. xelkê wê gelek jikurdînyê xerîbin.liser wan çend bihustara,gelek asteng hene ku rê liwan digirin,ku av û bayê kurdînyê lirexê dî venexun...

Wan jî hindek diruşim û tîtal jidujmnê xwe wergirtîne. wek axivtin bitirikî û cilik û kulavê turka.û fêl û direw û teşqele,û bê bawerîl

Lê her şiyayne sîmayê kurdîniyê biparêzin.

Diviyan gelek pirsiyara biken .gelek dinav pajêrî bigerin.

gelek jisilupî bizanin...

Lê jiber dest û darê leşkerî û demê kurt û wê rêya liberî wan.gelek tişt hêlan,Digel hevala lidemê bu diyarkirî, liêvariyeke biharî ,dane rê,berev stenbul...!

Beramberî hizira û tirsê û gelek kuntirila û pasporta sexte û cîhana bê dil û xerîbya mirov kuj.

her yê lipişt xwe dizifirt,û peşêman dibit,her şêrku yê wî qahym û asê dikit,hêştta simku jizivirînê bê umêd ne buye.dibit nihu licihê kuntirulî,bêjitê:

" paspurta te sexteye,bizivire ."

lê her weku kesê ne dîtîn!her weku wan jî diviyan dûrkevin da ew bidilê xwe dinav welatê wan da biçerin.

Simku dest havête xame û deftera xwe,û biriyar da carekadî jiyana xwe ya rojane binivêst.

Roj biroj,heta saxe,jiçirkeya jimal derketî,heta ew gava ew têda ...

Dengê hevalê wî hat û gut:

-eve cizirê ye ,binivêse,dem hijmêr pênci êvari em geheştin cizirê....

Cizîra buta,ew czîra hizar xewin pê didîtin û dîtina wê bibu hîvî û Mirad.warê mem û zîna,warê bedirxaniya.

Pasa wan licizîrê rawestyar,hindek av lê ve xwarin,lê neşyan jipasa xwe dûr bikevn.kelha wê hêştta diyare, mirovên wê gelek sebira



wan bê dihat,lê gelek çavên xwe gêran .da zîna zêdan bixemla  
bûkaniyê ve bibînin, gelek cavên xwe gêran da memê bejin  
bilind,siwarê buzê rewan bibînin.çi nehate pêş cava!

Ne birca belek,ne mîr zênedîn digel memê setirincê diket .ne zîne  
diulya bilind da memê şêt diket.

Tinê tijî wan kulana bekiruk bun.zanîn ku ci nemaye dê pasa wan  
dite rê !

Dîsan karwan birê ket,hind hatin xwar û hind siwar bun.

Destê hizira girt û pêkve çune diniyayeka dî .

"enqere,kelea sitemê ... stenbul,bajêrê hejara,warê kirêkara...  
kyêv, bajêrê çêrnublê

... burdislava,baxçê evînê ... birno,ew bajêrê navê wî lihemû mala,û  
nîşana mêramyê liwelatê me jiber navê tivenga birno...

birag,bajêrê sîxura,fêrgeha Serbazên stemkara...berlîn, bajêrê dû  
dila sêva jiyane,ya bu min buye duzex !

Car xewê dilê simku jihizira didizî û dibire cîhana xwe .lê her  
çendekê hevalê wî destê xwe limilê wî dida û ciwaiyna rêkê yan  
diyardeyek bu şiruve fikir û car jî di gut:

- binivêse,demjmêr...em gheştin msebinê ...qizltepe,... weranşare  
... orfayê...

Wesa diyarbu ku jituxîbê welatê xwe derketin . çunkû bêhna  
xerîbyê dijwar dibu...

Xewê ser jihemû tiştê stand û dinav dile xwe da veşart.

hindî dilê wî yê pir kuan bu û hindî hizirên wî yên belave û dijwar  
bun,êkgirtineka xav dirust kirin.bire dinav guvenda hevala da,car jî

wek sîmerxa lihindav serê wan çerx didan,car jî dikire gunhebarekê mezin û cîhan hemû bidûv diket !

Lê lidawiyê liser kursîkeka bilind dirûnişt û hemûya bêkve guhên xwe bel dikirin û simku bu wan diaxivit .

Biriyara lêxweşbuna hemûyan dida...biriyara berdana hemû girtiyên û hemû gunhebaran...diyarkirina berzebûyan...biriyar dida ku lihersê dana millet hemû têr bixut..hemû xizmeten şarstanî û dewletê bu wan bê beramber bin ... şol bişev û roj.şarstanî berev peşve.

ya jihemûya vertir,tenahî,hemû dişen lişev û roja,liçol û aqara binivin.ew dê zêrevaniyê liwan kit.

herçende pêdivînakit.ie da piştrast binivn. yeksanî...avedan...aramî.

Simku da heşta biriyara dit .lê hind dît ku zêrevanê wî yê destê rastê deve kilaşînkufa xwe kire diteniştê wî ra û teqand.

digel qêriya hemû milletî hişyar bû,ku ew tilên hevaie wî şerku bun diteniştê wî ra û yê bidevekî tijî kenîve dibêjit:

-hilu em gheştine nêzîkî enqere!

Dunya wek hêkê ya sipiye, befir ya dibart.

Simku çavên xwe perxandin,xwe jêkvekeşa,hate cîhana rastiyê.

Dihizira xwe da enqere ciwantir û peşketî tir didît.lê wesa nebu.ma dê çewa peşkevit,Ger xudanên wê hemû dahatiyê milletî bidene şer û mirov kujiyê .

hemû pêkulên wan jibu êketiya ewrupî,na ghen çi asta, jiber beşekirina mafe mirova .

Rijêma leşkerî û pulîsî û pûte nedana mafê gelan û berîka wan ya vala. her yên liser wê rê diçin, û her yên kevin dibin, û her birs û hejarî ya zêde dibit. jiyana ya rawestiyay, Kargeh diêne firotin .tirsaya paşerojê , her ya zêde dibit .bawerî nema

.peywendî neman. Mirovayetî nema .hemû tişt berev nemanê diçin .tinê, leşker zêde dibit, polîs zêde dibit, çek zêde dibit, girtîxane zêde dibin, çayxane û mizgevit zêde dibin....

Enqere, wek paytextê dewletê ewrupî diête niyasîn, lê jipîsatiyê û jirêkên bêseruber û avahiyên kevin çî diyar nakit. mirovên wê rengê birisiya diden, hêştaya yên dimêjoya xwe diçerin çihizira paşerojê nakin.

Dîsan qunaxeka dî û bêhinvedaneka dî, pasa wan guhurîn û gutin, divêt hûn hindêk parên dî biden. lê kirine teşqeleyê, eve karê xelkê vî milletiye, hemû bazarên wan direw û fêlin, çî rastî linik wan peyda nabit.

pştî demekî carekadî beref stembulê danerê

Deftera rojanên xwe jibin serê xwe kêşa derê, her çende wek seruberê wî, ew jî çî tê nemaye, lê şiyaya têda binivêst.

evro sipêdê seyê pirejinekê ez jixew rakirim . heta nîvro linanî geriyam, min nedît! ew harîkariya bu min diêt, berî dû rojaya xilas buy.. limin carekadî bu şev!

Ne kare û ne cihekê tena, kempa me roj bu rojê tijî mirov dibit, peywendî sist dibin, mirovayetî berze dibit. jora me, pitir jideh kesa têda dijîn, pitir jiheşt welatane, pitir jiçwar dîna û gelek hizirm û buçuna"

Lirêza dawiya deftera xwe nivêstî...

"erê şeva min dê çewa bite roj??"

Êvareka bihariya direng, mirov jicîhê pêt xwe pitirin. deng jideva jidesta, pêya, jiamîra, jiturimbêla. wek tîra dibarin.

Bêhna xuhê û pîsatiyê, digel pêhna biyanyê têkel buye. wek bêhna xûnê xweya dikit.

Wan serucavên girê û rapêça pulîsî, ciwaniya stembulê berze kirî, lê her wek kiçeka çavmê, stembulê şiya hizira wî û çavên wî bidizin.

Gelek caran milê wî bimilê wan mirovan diket û berpên xwe ne didîtin.

- hûn ev şeve mêvanên minin!

wî biraderê digel wan jixûbî hatî gut.

Ku eve salek û çend heyvekin ew bibiçûkên xwe ve ketiye kulanên stembulê, û bune Nêçîra rêberekê bê dil.

Xozî nihu êkî gutiba min, tu mêvanê minî..

ez birbame mala xwe, xwarin, vexwarin, lichekê tena û xuş nivistbam.

ev welate gelek seyre! Pêşketina wan gelek jimirovayetiya wan û peywendiya civakî kuştîye!

Jinka wî digel biçûkekê dûsalî, dibindaveka kure dane. hatin û cuna wan bidizîveye. Jiyana wan wek ya girtiyên wê dewletê ne!

Piştî bêhnvedanekê û nanxwarinekê, zanîn ku ev biradere, Mamustayê zankwyê bû. Xudan mal û mirove, wî jî destê jinka xwe û kurê xwe girtin û berev bereze bunê ve hatin. wan jî çi nema, ne kirî, heta jiwelatê xwe dûr bikevin!

Piştî mêvanên xwe baştir niyasîn, serê xwe hejand û gut:

- me hemûya welatê xwe hêla,her kesê hindêk fiyanên baş hebin,welat hêla.

Ez neşêm bizivirim û neşêm derbazbim!

ez yê mayme hlawîstî .

Xemên wî hatin ser xemên wan,barê wan pitir giran bu.tirsa wan zêde lêhat.

Nimune jivî rengî gelekî.mêvanên husa tijî stenbulê ne.

Suhbet û axivtina birin gelek babeta,lê wî biçûkê dûsalî jigelek ziviruka diînan derê,devê wan gelek cara bikenîeka şermên dixemland.

Simku dibire ber landika biçûkê wî.

"erê dibit ez wî nebînim? Dibit ez jî livan kulana,

Bê pare û bê hîvî bimirim? "

Lê her wî Mamustay digute wan û bu nimune û belge diînan,ku gohê xwe ne dine kesê,û baş rêya xwe diyar biken.parên xwe nedine çî rêbera,û baweriya xwe bikesê neînin,her Digut û her dûbare fikir,ku nihu çî rêk nînin.her kesê bêjit rê hene.ew neweyê dibêjit!

Carekadî diniya liber çavên wan tarî bû rê liber wan berze dibûn!

Liser van gutina ra,û liser halê wan ra,deng basên Kurdistanê tijî hemû telefziyunên turka bun ..

nexuşî û şer û kuştin û hêrifên leşkerî.dever hemû girtîne .vê carê wesa diyare ku gelek ya dijware ...!

Berî binivin gute wan:

-em digel dû biraderên dî livî xanî dijîn û dibit ewjî nuke bên!!

eve bû cihê tirsê û gumanê .herçende ew jî xelkê welatê wane û mirovekê Mamustaye lê neku wan bişelînin û parên wan bidizin?Neku bikujin, jiber para?û neku û neku...?

Şêrku her wê gavê bu êxsirê westiyan û xemên giran û nivist .

Simku neşiya binivit,ma hşiyar heta nîf şev .

Dû kesa hildane jor,xudanê malê da dûf wan,cihê wan nîşa dida ! her êkê jivan kêreka mezin didest da bu !

Seru çavên wan dirapêçay bun ! Didanên xudanê malê xûn jê dibarî !

Lidur cihê wan zifirîn,diviyan berî wan ser jê biken, hindek yariya pê biken,hindek bend û heyrana pê bêjin!

Xudanê malê yê bilez bu,da parên wan bibet!

- pare bu min!Serê wan dilê wan ,cilkên wan,bu hewe. min pare divên..dular...dular...ha ha ha ha

Destê xwe havête devê wî,bêdeng hêla,neşiya hewara xwe bigheînite hevalê xwe ! Dengê wî biser neket,huişik ma,çi jê nehat .

Berî wê kêra dev tîj liser stwyê wî bihemû hêza xwe bişidînit ! bu cara dawiyê berevanî jigiyânê xwe kir û bihemû hêza xwe kire hewar!!

- ne...neee...heware...heware...

-ew ci bu??te xêre??

- ci nîne , ci nîne ...xewin bu, xewin.

hevalê wî carekadî xewê dil lê dagîr kir û dinaf perên xwe da veşart.

Simku ma hişyar,jitirsa xew jê revî heta dîtî dû kesa hildane jor .û êk jiwan niyasî,jinû tena bu û nivîst.lê hevalê wî jinû bidûristî hişyar bu û gut:

-ewkî bun?

Şêrku beruvajî tê gheşt,lâ bu tirs û recivik,û xwe bisîngê hevalê xwe vena û gut: -ez mirim jiserma,tasarê ez kuştim !

Ji xewê simkuy ageh jê nema û nivîst .

Sipêdê zû pêngava wan ya êkê digel rêberê êkê bu.

-hûn bixêr hatin.

- supas ,bira me divêt bizûtirîn dem jivêrê derkevin, parên me diamadene .

- qunaxa we kîveye?Zehmet nebit ?

- me divêt em bighene elmaniya.

ew elmaniya eve hinde salin em xewna pê dibînin û bume buye berêbeîtê.em nivêja bu dikin.

Min nezanî dê lielmaniya bime amanşu û paqijkerê cada.min nezanî dê lielmaniya berze bim.

Dê jimejî û hizira bim.dê jikes û kara bim. ka ew elmaniya diserê me da?ewa me diniyasî?

Ka ew mirovayetî?Ka ew dîmukirasî?Ka ew jiyana bisanahî?Ka ew biheşta min xebat bu dikit?

- gelek başe ,herin xwe biseru ber biken.ez dê hewe piştî dûsê rojên dî deme rê .

jibîr neken simbêlên xwe bitiraşin!da xulkê ewrupiya hewe bidit.lê divêt her êk jihewe pênc hizar dular hebin!

ew simbêlên min hizar cara sund pê dixwarin.. ew dularên min hizar direw kirîn heta kum kirîn...

\*\*\*

- bira divêt tu harîkariya me bikî.em jilayê biraderên te ve hatîne,me wek biyaniya ne hijmêre.

-eve nabite asteng,herin wek min gutî.bila ev hevalê min digel hewe bêt da hewe biseruber biket û hindek pêtiviya bu hewe bikirt .

Ketin dûv hevalê rêberê xwe,dinav kulanên stambulê geriyan.diviyan gelek bigerin,lê wî hindek bazarên taybet hebun,diyare wan êk diniyasî .

- divêt her êk jihewe,,^êrtekî,husa bikert,digel vî rengê kabuy,û pêlaveka putîne,û berçavkeka tarî, û çizdankeka teniştê û ....û....

rojên cejnê hate bra wan . dema babê wan yan dayika wan,diberî wan diket û dibirin bazarî û lidûv dilê xwe bu wan cilik dikirîn.

Devê xudanê bazarî beş bu û digel êk axivtin û pêkve çune paşya bazarî ...

Piştî birîn nik hevalekê dî û seru rîhên wan tiraşîn.wek wî viyay, wî jî diyariya xwe divêt,gutê:

-hûn dişên biçine cihê xwe,divêt hûn wek me gutî diamade bin lidemê diyarkirî û parêt hewe didûrist bin.

her dû bikeyv û dilxuşî zivirîn nav bazarê stambulê.gelek geriyan,ciwaniya stambulê ya mêye,hizir dize,rojhelatiya wê,digel roj ava û ewrupa têkel buye.Tameka cuda daye seru sîmayê wê .

hejar pirin,gerok pirin,gerîle û biyanî .

dewlemend û sermayedarî,ser jigelek dîdarda standiye. ciwaniya jinê ya xûyaye.liser



wê rapêça turka û seruberê rojhelatiya wan ra,û jiber mêvanên biyani û ewrupi,mirov hest diket ku eve parçeke jiewrupa.

lê tinê kevlujanke heker mirov kûr biçit,wî kevlujankî vedit.dê tijî difina mirovî bêhna kevnatiya Usmaniya bit. û heker kûrtir biçî,dê wênê etaturikî ête pêş çavên mirovî...!

her kesê geriyaneke dinav stenbulê da biket,dê zanit ka vî bajêrî çend belnkaz hene,Çend birisî hene,çend bilêdil hene!!

Mirov,mirova difiroşin,xwe difiroşin.bîrubaweriya difiroşin. jibu peydakirina nanî!

Stenbul wek cîhaneka biçûk diyar diket .lê her ^tê kirêt û berçav,ew polîs û mîta jihemû cur û rengên mirova pitir,û diyartir bun .lê ew polîs û mît gelek bisanaey razî dibun.her kiriyarek her xirabêk dihate kirîn,beramberî çend dulareka .

Dular liser hemûya zal bibu.dular dadwerû dadperwer bu.

Divê ziviruka diwara jiyanê da herdû berze bun. jiyan dikupka livîn û berevanyê daye

Divêt jiyan berdewam bit.divêt ew dinav da berze ne bin.wan hîviyeka liber .rêyeka liber .hind dît liwan bu êvar,zivirîn beref mala hevalê xwe .

demê serhatiya xwe bu gutîn,bidengekê bilind biwan kenî gut:

-eve axivtina hemû rêberane ,heker rast ba kes listenbulê nedma!

Bişev liser cihê xwe yê dinav pêlên hizira da xendiqî.

hevalê wî her wê gavê simbêlên xwe tiraşyn û xwe amade kir.

Simku neşiya jitirsa zifirînê simbêlên xwe bitiraşt.

bê simbêlî dinav hevalada.dê bite pêtiranik.û eve şeva dawyê jinîvyê burî.Û hêştta yê wesaye .her heval yê pal didin,berhef

dikin.lê tiştekek gelek mezin didanit Ku cara êkê mirov simblên xwe bitiraşt.liwelatekî wek welatê wan.ku simbêl nîşana zelumîniyê û mêraniyê ne.

her kesê destê xw havête simbêla û pê sûnd xwar,diête girêdan û çî car lêve nabit ! Babê wî herdgut:

- şerme zelum simbêlên xwe bitiraşt,mirov bisimbêla zelama jijinka dinyast!Zelum bisimbêla zelame ...

eve digut,jiber hindêk hevalên wî ewên bêsimbêl û jîtîrsa ew jî bitiraşt!

heker derbaz ne bu ? heker zivirande rexê dî?

Dê çewa bê simbêl çite mala xwe? Dê çî bu bêjin?

„ eve dû roje çuy simbêl tiraşîn,heker çend saleka bimînit dê çî ket??,,

Kes bawer naket,ku eve bixwe ne kiriye !eve bifermana rêberiyê. eve baca derbaz bunê ye. eve pêngava êkêye jî bu derketinê jikevlujankê xwe .ew kevlujankê gelek asê,û girêday bigelek rewîşt û tîtalên paşvema,gelek

girêday biol û xêl û netewey ve.û wan milletên dewrubera,ewên heta nihu dagîrkerên wan jîhemû layenave !

herkesê jîwî kevlujankî der kevit.eve ew xiriya..!eve ew jîrêya rast derket ! eve ew bu benîştê devê neheza !!

Piştî gelek diserê xwe da gêray û çuna wî û paşeroja wî, mal liser van simbêla.her çende çîrêzu qîmetî nadite van tiştê!Lê nevê bîsanahî bibite benîftê çîdeva .

Lewra her dem xwe jîvan tiştê parastîye !Lê divêt nihu pê livan hemû tîtalên jengî danit !

Xwe jidil û jinû bu jiyaneke dî amade kit .

dibit gelek asteng bikevne dirêya wî da,Lê divêt yê amade bit.

Piştî bê hîvî buy û şev jinîviyê burî,pêl cegera xwe dana û smbêlên xwe tiraşîn !

Demê jiserşoyê derketî,hevala biwî rengî dîtî,kes nema liser pê n xwe,bî tîqtîqa wan,bidengekê bilind û bikeniyeka jidil,simku kirine pê tiranik .û bu pêkenînkê wan.

heta berê sipêdê hevalê wî dikenî,gelek cara dixewda jî dikenî .

-helw...em yê listenbulê û rê nîne,çi biken başe? -herine Ukiraiyna,dê zû derbaz bin!

- birayên me nahêlin .jitirsa rê û mafiya...

- gelek xuşe,tena û erzane.

Wan ne diviya çi tiştta biken,bêy agehdariya birayên xwe ,ewên bu wan harîkariyê diken,û jimêje liderêne û baş divî warî da dişareza ne .

Biwan telefuna jî razî nebun,diwan çend roja da,gelek rêk, û gelek rêber dîtin .

Lê bê baweri û rêya asê û nexuş û tirsî jipaşerojê hêlan liser rêberê berê .

Dîsan zifirîn nik rêberê xwe ,her roj da çine sûka û da gerin,heta roja jivana wan digel rêberî dihat,dimana lijivanê,lê kes diyar nebu,telefon kirin,telefuna wî ya girtî bu, gelek westiyana û mendheoş bun .

her roj yê bisedan kesa dizifirînine welatên wan. girtîxane dipirin,rê û rêbar her asê dibin,hîviya wan her kiz dibit!!

Deh roj burîn û her yê diagirê xweda dikelin,,vîza,, wan bidawî hat û çine kirin .

-helw..bira em man livan kulana .ew rêberê hewe girtî çi nekir. em çi biken?Parên me her yên kêr dibin û girtina me roj bu rojê nêzîk dibit .

- bira, xwe ture nekin,ew rêber yê baweryê ye, lewa divêt hûn xwe lê bigirin .

-evro jivanê me bu, nehat!Telefuna wî jî ya girtiye .  
xwe lime vedşêrt .

- ne, ne, xwe na veşêrt ! diyare tiştêk mezntir heye, lewa diyar nebu ye!!

Divêt hûn çi tiştê neken, û xwe lihîviya wî bihêln.

„ -pasport ..pasport,,

-eve ew bû ya me digut!Ka em hatin girtin yan ne??

Wek gurgên har xwe lidura kirine rêz .dawa pasporta jê kirin.

Baş sehkirin û pasportên wan jê standin û digel xwe birin.

Dijwariya polîsên turka ya binavudenge!Ji tirsê zivirînê û Şelandinê derketin piştî hindêk pirsiyara û axivtina,tama devê wan zanî,û hindêk pare danê û berdan.

Bu wan diyar bu ku ev welate jiwelatê wan wêran tire, divêt bizûtirîn dem jê dûrkevin.

-hûn bixêr hatin bira !

-- Xêrendar bin ,biburin, hewe çi libere?!

-em jî yê lihîviya cuna jiderve .

-her digel rêberê me?!

- bilê, her ewe dê mejî hinêrt .lê eve pitir jiheyvekê ye em lihiviya wî .wesa diyare rêya wî nemaye!!
- barê me girantir lê hat,piştî me mala wî hevalî jî hêlay û em ketîn utêlê .
- liser hemûyê ra her çend şeveka polîs diêne utêlê ,û divêt em razî ken !!

Liser giraniya stenbulê û liser giraniya xemên wan,gelek şeva heta sipêdê xemên xwe dikuşa jineka pirsî da dixendiqandin

Lirojê ne dişyan çend gaveka jiutêlê dûr kevin,ji tirsî polîsên nêçîrvan,ku karê xwe kirîne rava biyaniya.

Lê şev û roj bidawî naên,û husa bu wan dest nadit. dişevê da digel hevalê xwe biriyar dan ku rêya xwe bigihurin û guhê xwe nedine birayên xwe,ewên ev rêbere dîtî.gelek geriyan,gelek telefon kirin bu heval û biradera ,her cihê kesek jî lê çubit,pirsiyar kirin.

Telefuna hindê hevala kirin liukraiyna,ka wêrê çi rê heye?

- bizûtirîn dem xwe bighînine ukraiyna,gelek xuşe û rêk bisanahi û erzane,rêberek amadeye,piştî çend rojên dî dê me hinêrt,hûn jî werin da pêkve derbazbin.

Zêde barî van hemûya,hûn dê hindê rojên gelek xuş burînin!hûn dê jinû tama jiyane zanin,û dê careka dî bine zava...ne, ne, dê gelek cara bine zava!

herdû bikeyf û dil xuşî ,wê şevê nivistin.

sipêdê pirsiyara birayên xwe kirin,wan gut:

- bikeyfa heweye,belê ne bidilê meye!

Dîsan man didûdiliyêda.nediviyan çi tiştî bêy dilê birayên xwe bikin,lewa xwe girtin û man.

Xuzî û hizar car xuzî,ez liwêrê zivirandibame,bila ez ne hatibam,bila min gohê xwe daba birayê xwe,çend cara digute min ne êy ! welatê biyaniya bu wan xuşe,bu me çi

xuşî nine,bê şul u bê qimeti.

lê min guhneda kesê .heta ez ketîm divî deravî da.

min digutê,pa bu hun na zivirin??

Min ne dizanî ku ew yên mmn!ew yên jizivirînê bê bar buyn!Zivirîn jî wan pê çê nabit!!!

Tinê digut:me xwe sutiye,hûn xwe ne sujin!,,

Stenbul wek muzexaneka mezin xweya diket,her cende pîsatî û bê xudaniya wê ya zêdeye,lê dîroka wêya parastiye,ew kesên behsê wê kirîn,ne diniheq bun,wesa diyare rêberên Usmanya hemû dahatwyê îslamê livan mizgevtâ mezaxtîne,lewra ne şiyayne çi bu xelkê xwe û bu paşeroja wan biken.jibilî van avahî û mizgevtên seyr!

Karê herduwa bu geriyan,her çende geriyan wan gelek bitirs bu.wek diza digeriyan.her çend pêngaveka turimbêleka polîsa ya rawestiyaye,pirsiyar û lêgeriyan. berdewame,her wekî hindêk mêrkuj yên dinav bajêrî da xwe veşartîn!!

heyva wan bidawî hat^ştâ diwî seruberî da.

Bu cara duwê û siyê,ew hevalên berî wan,jifirukxanê zivirandin û rêk nebu,rêberê wan jinû gut:

- rêya min nihu nemaye !divêt xwe bigirin.

Vêcarê jidil her duwa biriyara xwe ya dawiyê dan.parên xwe jirêberî wergirtin û qesta

vîza ukiraiyna kirin û birayên xwe aghedar kmn.wan jî vê carê xwe razî kirin.

Simku bidilekî pir kuan gut:

-eve min çi kir?eve min çi libere?

Qunaxa min dirêj tir lê hat.ez hêr bum!Min hemû tişt yên jibîr kirîn!Birayê

min,pirsiyara navê kurê min jimin kir,ewê min bu dilê xwe binav kirî û hêlay,min navê wî jibîr kir,ez yê mendehoş buym,çi libîra min ne maye .

Şêrkwî gut:

- Dijwariya jiyane rê berze kirin.divêt em jivêrê jî birevin,eve ne cihê jiyane ye.tu heqî

navê xwe ji jibir biki.

Wan herdû hevalên liutêlê jî biriyara xwe dan,nihu bune çivar û pêkve vîza ukiraiyna wergirtin .

Piştî dû rojên dî,dê dine rê beref ukiraiyna.

Piştî dû rojên dî,dê stembulê hêlin,ew stembula gelek lê geriyayn,û êk jisedê ne dîtîn.ew stembula tijî hejar û pale.ew stembula mirov,mirova lê dixunlew stembula buye gurepana polîs û sîxura.ew stembula gelek mirov berze kirîn,û gelek jihest û bucuna dizîn.

Stenbul nihu ya buye bajêrê xwe firutinê.

hind mal û mlkê xwe difuşin,hind bîru bu çuna difiruşin, hind leşê xwe difiruşin...da pê bijîn l

Stenbul ya buye hêlîna çep û rasta,regez persta, ayn duza,bihemû renga mav berzeye.bêşêlkirna mavê mirovan, sîmayekê xweyayeOll

Stenbul ya buye bijêrekê bazirganiyê,hemû tişt lê diên kirîn û firutin,lê bazareka bê bawerî û bê wijdan,direw, find û fêl,giranî,dizî û mafiya...

Liser van hemû polîs û desthelata leşkerî ra,stenbul ya buye bajêrê bê baweryê.

her çende gelek jixelkê stenbulê xwe liser ewrupiya dihijmêrin,lê kes wan wesa na bînitdilreşiya wan miruvayetî ya kuştî II

Berî jinav vê gêleşukê derkevn.bu cara dawyê xwe berdan nav bajêrê stenbulê.

Vê carê bidilê xwe,bê tirs geriyan .jiber vîza ukiraiyna ya hey.çi polîs nagirin.

Liser van hemû gutina,stenbul gelek ya lipêş çavên wan ciwane û liber dilê wan ya

bênveker û cihê geriyanê û xwuyê ye,lê pişti dû rojên dî,dê hêlin.dê bine mêvanên

warekê dî,dê bine êxsîrên welatekê dî I

Lifirukxana stenbulê,ew firukxana hinda asê û bisheml

Wan hind polîs û asaiyş û mîta dijwar.

wan kamîre û amîra,wê berfirheya hinda aluz.

Wek pepûka dinavda digeriyan . eve cara êkêye,cihekî husa dibînin II

heker mirov wan polîsa ne bînit,heker mirov wê rapêça turka nebînit.qed bawernakit eve axa turka ne.. I

Firukxaneka berfireh û pêşketî,gelek hol û cihên rûniştinê û xwarinê û bazar.

her liber dergehê êkê,serubin lê geriyan û kuntirula çante û paspurta.



Jinavda wek muzexaneka ciwanyê ye, pire jimirovan, mêvanên wê, ji hemû tuxim û renga ne.

-hê, hê, eve cara êkêye ez firukxanê dibînim! eve cara êkêye ez paspurtê heldikirim, herçende ew jî ya sexteye.

eve cara êkêye ez bifirukê geriyane dikim, ew jî heker hêlan ez derbaz bibim !

Çavên simku man zil wek gêja û her di gut:

- divêt husa ne mînin, demê me çî ne maye .

Bipirsiyara xwe gehandine kuntirîlê êkê, her çende eve ne kuntirulê serekiye, jiber seru

berê wan û rengê paspurtên wan. bune cihê guman û lê geriyaneka dijwar.

Jixelkê dî cuda kirin û gelek pirsiyar û lêgeriyan.

dîsan gelek westiyan û bê hîvî bun, û gelek cara dihizira xwe da, zivirandin welatê wan, gelek cara dibirine girtîxanê û gelek cara ciza û dilreqiya wan dihate pêş çava, her kesê eve digirin, dikene nîvemirov rût û bêpare, jinû dihinêrine welatê wî .

Bêhna şêrkuy teng bu û gut:

-erê heta kengî em dê husa mînin? erê dê mejî paspurteka bibiha û danpêday hebit? Simku axivtina wî birî û gut:

- ne, ne, bêje !! erê heta kengî em dê revin? Ê dê kîve çin?

-- erê..erê... ??

Gelek pirsiyarên bivî rengî jixwe kirin .

Lê demê simku ketîe dinav wan destên req û giranda, hest kir ku gelek yê bê hêze, û xwe liber çî nagirt. zanî ku hêz û şiyana rojên tulazîniyê nemaîne. demê ketiye dinav

destên dujmnan da û hindi lêdan û êşandm. çî jê nezanîn, navê çî hevalên xwe nedayê . xwe aşkira nekir.

Lê new, tepa êkê dê sed nava jibinê pê xwe îniteder, bitepa duwê dê xwe kite berpirsekê serekî .

Lê wî ne dizanî, ka eve jilawaziya leşê wî ye? Yan jilawaziya baweriya wî ye bipaşerojê?

Gelek gîru kirin, gelek pirsîyar û lêgeriyan.

hevala xwe amade kirin, çantên xwe danê û derbaz bun nav hola serekî. hêfta ew yê dinav destên wan da, wek mişkê kitka girtî! Lê hêştta gelek kuntirul û lêgeriyan hene.

Liber wê pencera biçûk, ew kurtulaz yê rûniştî bu .

Simku wek pepûka rêza xwe lidûf mirova girt, paspurta xwe dayê . her êkser serê xwe bilind kir da xudanê wê paspurta dinav destada bibînit!

Simku xwe têk neda, her wekû ew ne paspurta wî. polîs gelek dinav perên wê geriya û gelek jihevalê xwe pirsî, lidawiyê destê xwe bilind kir û murek lê da!!

eve bawerî bipaspurta wî hat. eve mafê derbaz bunê dayê. eve bu mêvan, divêt diçend dem hijmêrekada, welatê wan bihêlin!!

Bawer nekir heta jiwî dergehê birex wê pencerê ve derbaz buye hola mezin.

Gelek mirov lê dirûniştî bun, lihîviya firukên xwe .

Zanî eve axa azade ,eve tiranzête,jinû baş rihet bu û bawer kir ku ew kabirayê bu wî paspurt dirist kirî,yê zîrek bu,wî rast digut:

„ ev paspurte gelek jiya xwemalî rêkupêk tire,,

Şêrku piştî hatîe nik wî polîsî,gelek gîru bu û gelek dinaf perên paspurta wî geriyan û piştî gelek pirsiyara û gelek gîrubunê,bihindek dulara ew jî jikuntirlê dawiyê derbaz bu !

ew paspurta hemû dizanin ku sexteye,lihindek dewleta vîzê didenê,mafê seredana heye.

Wek diza û pepûka,çav tirsiyay litiranzêta stenbulê rûniştin lihîviya demê diyar kirî.

Çend kesekê cilik polîs didîtin,her wekû liwan digert.her çende kesek digel wan na axivît û kesê ageh jiwan nîne, lê hêştta tirsî polîs û asayşa rijêmê digel wan maye!!!

Lidemê diyar kirî,her car ketin lidûf êk û pilêtên xwe dirust kirin û paspurtên xwe amade kirinjibu derketinê. lirêza mirova rawestiyân,heta gera wan hatî.

Liber dergehê dawiyê,mirovekê nav çav girê,rawestiyay bu.gelek pirsiyar û lê geriyan dikirin,û taybet liwan kesa ewên paspurtên rojhelata navîn heyn,û jiwan jî ewên xelkê Kurdistanê.

-hûn biyanî çî kin liwelatê me?hewe welatê me tijî kir!! -hûn bu diêne welatê me?!

-hewe nekar hêla !ne tenahî!

- çî şula ne dirêda,hûn wê dikin!

-em razî nabin,hûn êdî penaberyê livan welata werbigirin.

-em ewrupî,dê biriyareka tevayî bivê çendê den!!

\*\*\*

Demê gera simkuy hatî,çantê wî serubin kir û ^ê wî dûsê carî perxand9î.herweku likêç û sipîha digerit.liser hindê ra,her baweriya wî nehat û gutê:

- dê kîve çî?
- çi çek,çi dermankên bêhnê linikte hene?
- te çend pare hene??
- dê çend roja liukiraiyna mînî?
- çi rojname,belavuk,pertuk digel te hene?

eve hemû ne shîr û guman bun!Lê dema ev pirsiyare bizimanê wî jê kirîn,her wekû xelkê gundê wan!!

Simku bersiva pirsiyarên wî da û derbaz bu.

Lê serê wi wermi û lê bu êş û digut:

-heta kengî em dê xizmeta dujminê xwe kin?heta kengî em dê dujminatiya xwe kin?

heker vî biraderê he,bivî rengê husa dilsax bu millekê xwe kiriba!Nihu berî çend salan,em dewlet bun!erê eve kurde ?erê wî hest kir,em milletê wî ne?

Şêrkuy bersiva wî da û gut:

- ne, ne ,heker wî dil xwîna kurda hebaye,da bu me bşkurt.da me zû dite rê,da harî me kit.ew jimêje jikurdatiya xwe ketiye ew jimêje buye kurê turka.

her şureşeka kurda.her serhildaneka kurda,her pêşketineka kurda.her kurda Bi xwe bin axkiriye..!her kurda şikandiye.her bidestê kurda bidawî hatiye ...!!

Simku bênteng bu û gut:

-erê,lewra em dê her husa mînin!!

her serê xwe dihejand,her hizira dixendiqand,her diwestiya,her diviya zû birevit!!

Lihola dawiyê,pişti ewên dê çine ukiraiyna jixelkê dî cuda kirîn,lihîviya pasa man da bibine nik firukê.hindek kesên dî jî dîtîn ku xelkê devera wan bun,wan jî revîn helbijart bun jimanê .wan jî xwe qurtal kirin.eve ewjî bune Alivê bay.eve ewjî bune êxsîrên paşerojê .bune girtiyên xerîbiyê!!

Salehasal,xebat û karkirin jibu destînanana mafekî bu gelê xwe .şureş û derbederî.şehîd û qurbanî.Idawiya serketina şureşê û bidest înanana gelek jimav û desthelatê carekadî

bun rêvîng û beref rêya bê dawî çûn!!

"em liçi digerin? Me çi divêt?

erê ma ew parça erdî didestê meda,me têt naket??

erê ma em ne şên,birêya we parçê, derunê xwe têt biken?hîvî û umêdên xwe bicih bînin??

erê man baştîre, yan derbederi?? erê dê dawiya mişextiya me çi bit?? erê...erê...erê???"

Van pirsiyara diserê simku da wek deholê deng vedida.

Dinav firukê da û piştî cihên xwe dîtîn biharîkariya xizmetkerên firukê,pitir rihet bun. Firuke bu wî tiştêk nû bu,eve cara êkêye lê siyar dibit, husa jinêzîk dibînt. hindî wî dîtî,her firuka agir û barut liwan reşandîe,çicar husa nêzîk ne buye. her kesê firuke nêzîkî wî biba,da bite dawiya jiyana wî..

Mirov gelekî,jî hemû renga.piştî hindek axivtina bizimanê inglîzî û turkî û rusî.

Çi tê negehiştin,wan jî wekî wan kesên rex û rwîn xwe kirin.ew qayşa bikursîka wan ve bizikê xwe ve girêdan, û çavên xwe neqandin,heta firuke jiaxê bilind buy.

hevalê wî şêrkuy hind pwîte bivan tiştê nekir,wî diviya her tiştêk rû bidit bibînit û gut:

-eve me turk û stenbul jî lidûf xwe hêlan û hîviya uxera bêt,ka dê çewa bit??

Libilindahiya ewra,erd wek zevyeka candî diyar dikir.

ew xaniyên liser erdî dibun kulkên mirîşka.

ew mirovên hind bishem û hêz,dibune mêrî û kêzik..!

hinde cara hemû tişt berze dibun,dinav ewrên sipîda û dhatin veşartin!!

-eve husa, van firuka şere me dikirin?em da çewa bibirinuyê şere vê sîmerxê kin?

hizareha mirov hatin kuştin û sedan gund hatinsutin.

livê bilindahiya tirsinuk!Çi jikesê ne dihat!çi şer naête kirin,mirov ne şêr şere asmana bikit... !

ev hizire belav bun diserê simku da Demê firuke hejiyay û lertzî,bîra şureşê hat bîra wî,demê firuke liasmana disutin,di bu keyf û tîlî

Lê new ne şureşe ,eve demekê dirêje ne tirsiyaye!Ji wê hejandina firukê tirsiya,her wekû dîsan liberahiya şerî û dinav tankekê da û dujmin çend gaveka jê dûr.

"hemû amade bin!Amade buna pila êkê!Dujmnî dest bihê^ê kirê! em pêngava wan ya êkê ne!Bidawî hat!"

Wê carê hind dit û piştî çavên xwe vekirin,tijî ser leşê wi xize,û hevalên wî kes diyar nîne!!

Vê carê çavên xwe vekirin,dûkeçên gelek ciwan yên lihindav serê wî û xzmeta mêvanên firukê dikin.tinê gut:

-eve çend jijiyana me binexuşî burî?şureş û derbederi, ewên şureş pêçênebit.divêt leşkeriya dujminê xwe biket,ewên jivan herduwa bêbar,mêvanê girtîxanê,

Yan gurstanê ye!

Dipencera birex xweve,berê xwe dida erdî,hemû tişt jibîr dikirin û tirsawî zêde dibu.

- eve em çend dibê mejîne !?em livî asinî siwar dibin! başe heker tiştê lê hat?!Bîra mela mihê dihat bîrawî, dema digut:

-ewê bêjit mirov dişên biçine ser banê heyvî! ew gawre! Kes neşêt bihustekê pêt xwe jierdî bilind biket...

Lêvên wî tijî kenî dibun,

- ewê eve durist kirî,ew dizanit ka dê çewa gehînte binecihê...! hevalê wî destê xwe limilî da û gut:

- tu dizanî,çend kes jixelkê welatê me divê firukê da ne??

Simku wesa bawer dikir,ku ew kesên wî dîtîn bitinê ne, lê her şêrkuy bersiv da û gut: -em pitir jisîh kesa nin,jibilî ewên lirexê dî yê firukê! eve bu cihê gumanê,simku gelek cara liser milê xwe zifirî û lidûf sêra çavên hevalê xwe linav firukê çavên xwe gêran!!

Jitirsa ku kes gumanê jê nebet,bilez zifirî ser rûniştina xwe ya berê û gut:

- tu dizanî em dê tuşî girftariyeka mezin bin likuntirula ukiraiyna?

Şêrkuy berî wî ev hizire kirbu û gut:

-her kes û bextê xwe.lê xwe nede digel rêza wan.

em dê çine rêzeka kesê wek me lê nebit,yan jî zû xwe bigehîne kuntirî. heker em derbaz bun êdî me nazifirînin.

Dîsan simku û hizira da ber êk û diguvenda wan da berze bû.gelek cara dihate girtin û zifirandin,gelek cara bisanahî derbaz dibû,car jî digut:

- xuzî eve hemû biba xewin û nihu birayê min wek her roj pênek lidgehê jora me daba û gutiba:

- hilun direnge,ma hûn jixewê têr nabin?

ewê birex hevalê wîve,xelkê hindêye,ewî dergehê hizirên wî qutan,û hate dîwana wan: -hûn xelkê kîrê ne?

- Kurdistanî.

- haa.Kurdistan.

Şerkuy tera wî inglîzî dizani,ew mane pekve.

simku zifirî pencera xwe,carjî çaven xwe wek diza dinav firuke da digeran,her bihusteka çend çirkeyeka bu bihusta dî.heta ew firuke dû se cara pîvay.taîbet wan xizmetkaren gelek ciwan û her çendeke dihatine hindav sere wî û biçav û deven bişkurî xizmet dikirin.

Piştî demeke kurt,xwarneka gelek xuş û bitam înan. digel kek û çaw qehwe,yan her tişte dil bixwazit,û hindî bixwazit

Rojen birse dişeru şureşe da,lireva milîwnî,hem hatin bîra wî,gelek şeva jibirisa xew direvî,gelek şeva jitirsa bîrs direvî,gelek cara hem dibun heval û giyan direvî!!

Ser le wermî bû,hiziren dirinde,reyen ase,dil reqiya polîsa,hemû bibun hevale mejiye wan.



Dideme simku dinav geleşuka hizira da rapeçay bu, denge bilind  
buye bise zimana gut:

- nîv demejmer ye may em de gehine firukxana, keyv.

Gelek tiştên dî jî gutin, le hind te gehştin. her diwe çirke da, xwe  
amade kirin.

Ledana dile wan zede bu. renga wan hate guhorîn. tirs û keyv tekêl  
bun, hîvî û be bawerî tekêl bun.

bîste wan zer kirin!

Carekadî qaiyş giredan û xwe ase kirin bikursîkave. heta firuka wan  
bidestqutan û bişkurîne ketiye ser erdî.

Xelik je hat der, wan jî da bidûv wî xelkîve, wek rezka meriya, heta nik  
we pasa amade kirî bu wan.

Liber derghee firuke, dû heta çiwâr polîsa dirawstiyay bun, tine silav  
werdgirtin .

hindek lirex û rwyen pase jî hebun, kese ageh je nebu, ji bilî wan .

Liholeka berfireh, gelek mirov û dergeh, wek ewen berî wan, ka xelik  
çi diket, wan jî we dikirin, heta gehîştîne ber pencereka biçûk. polîsek  
liber rûniştî bu, pirsiyar dikir ka çend pare hene? Ka de çend roja  
likyef mînin? Û hindek pirsiyaren bisanahî û be mane.

Wan jî xwe bu wan pirsiyara amade kirbun. bisanahî je rizgar bun . le  
ya bisehim û Tirs û ase kuntirule!

Jiyana wan hemû tirse, liroja jidayik buna wî, ciwar firuka lihindav  
sere wî şer dikirin. jibilî tup û muşekan, wek vîstevala keyve bû. keyva  
jidayik buna wî..

le licihe şerbet û keke... xûn û guşte mirova dibarîn... hihu her ew  
tirs ya digel may, ya buye hevale jiyana simkuy

her kesê çuye ber kuntirulî bisanahî derbaz bu,ewên pasputên îraqî heyn^ştta kesê pê licegera xwe ne danaye,lê husa nabit,divêt her sîngê xwe bidene vî çeperî jî.

Pist pist zêde bu,berî hol valabit hindeka xwe kirine vîdakar û ketin beramberî kuntirulî,piştî bicavên zil û tirsîyay dîtîn gelek bisanahî çuyne rexê dî.

Wek berîkanê her hindek çune rêzekê û êk bu êkî derbaz bun.jibilî ewên pasputên wan hindek têbînî liser.piştî demekî polîsekî dî kuntirulî dikirin,ew jî derbaz bun.

Nihu sîngê simku yê biçeperê giranve,ger gera wiye.

bêy wî mirovê liber pencerê Bibînit,paspurta xwe kire didestî da û xwe biçantê xweve mijûl kir.

hindek cara wek mirovekî şerim kirî,bidizîve berê xwe dida wî polîsî,ka çi dikit?

Lê zû dizîfirî çantê xwe

Dema jiçantey têr buy,çi nema yariya pêbiket,ma rûbirûyê wî kurtulazê dipencerê da.

Wî jî baş sehkirê bejna simku,careka dî paspurta wî têkveda û dana ser runahiyeka bihêz .

piştî gelek may û digel hevalê xwe axivtî.diwan çirkeyada deh cara simku Girt û berda.deh şeva ma digirtîxana turka da .deh sal jîyê wî sutin.paşî gut:

- paspura te sexteye!

Didilê xwe da gut,, raste sexteye,diniya hemû dizanî sexteye,,

lê xwe asê kir û bihindek axivtinên iniglîzî berevaniya xwe kir,wî polîsî çi iniglîzî ne dizanî.

Piştî gelek may licihê xwe,wek çavzilkanê digel kirî, polîsî zanî vî çî rê nînin.

Careka dî paspurta wî jê wergirt û dgel hevalê xwe baştir lê geriyan û piştî hol vala buy,bidevekê girinjînve, gut:

- keremke...

Destê xwe bu nav hevalên wî dirêj kir.

eve vê carê ji gheşte hevala,eve jivê tirsê ji rizgar bu, eve vê carê ji jiyê wi çend rojeka dirêj bu.

heval hemû hatin berahiya wî,her wekû jigirtîxaneka kirêt derketî .bêhna wan dîsan fereh bu,keniyê lêvên wan nexşandin .

Simku û şêrku û her dû hevalên wan,ewên digel êk hatîn jistenbulê karê xwe kirin û qesta jidervey hola firukexanê kirin.telefuna hindêk hevala kirin.êk hinarte berahiya wan,lê gelek man lihîviya wî hevalî.

Tirs beşekâ serekiye dijiyana wan da,ew bê tirs najîn. dîsan tirs lê bu mêvanltirs jimafiya û diza .hindêk jivan Şufêra dihatin û digel daxivtin, lê jitirsa,xwe dûr dikirin. Şufêra diviyan wan bigehînin naf bajêrî.wan ne dizanî ka Şufêra çî divêt.

Man diwî seruberî da heta ew heval hatî.piştî çuyne destên êk.simku ew heval diniyasî liKurdistanê gelek cara dîtîe û niyasînî dgel hebu.

Wî jî biçûkên xwe,welatê xwe hêlayne û ketiye van kulana.

„ erê ew liçi digert?hatiye çî?!„

eve pitir jidû salane jimala xwe dûr û bê pare ketîe vî welatê birisîl Bu wan dû turimbêl girtin û beref kiyêv û nav bajêrê kiyêv.

Kasêta mejyê simku wesa xweya dikir,,liwelatê me û lidemê şureşê,  
dijurên tarî û bidizîve,me jidil pertukên lînîn û markis  
dixwendinlem gelek pê daxbar dibunl

Me digut,wan şiyaye welatê xwe bikene biheşt.

ci kêmasî dijiyana wan da nyîne l

Wek mînak me ew diviyan,jiyana pala,dabînkirina pêtiyvên

wan,tenahî,yeksanî,mirovayetî,her çende rêberên nû hindek sisetî û  
bêxemî kirîne,lê her jiyana wan û sistemê wan bu me dê xewin û  
hîvî binll

Wek wê xewin û hîviya ew bu hatî û nihu buye aşub û berze bu.

eveye bajêrê kiyêv?eveye ciwaniya kiyêv?ew navê hindê mezin,ew  
hêz û desthelat?

ew zana û rewşenbîr?Çi diyar nakenlXwe ve şartîne? Yan jî wek  
gelek milleta bûne bîrhatin?l

Çi diyar nine jibilî wareki pêti û damay,rê û rêbarên bê  
seruber,mirovên reng birisî,bêna"çê mubêlê '^ştta ya jivan dar û  
bera diêt,tirsa wê tijî hemû kun û qulaçanell

Pist pista hevala kasêta mejyê wî veqetand.

Şufêrê pîremêr,ew jihevala veqetandin,û rêyeka dî girt.

liwan bu tirs û gumanl

-erê bu digel hevalên dî ne çu?

- tu bêjî me bidete destê mafiya

hindî pirsiyar jiêk kirin û tirsu wan zêde bu,şufêrî hest kir ku ne  
diaramin,piştî gelek cara ew pirsiyar jiwî jî kirîn,bidevekê

kenîve,navê wan hevala îna,ewên dê Çine mala wan.pitir aram bun,bawer kirin ku dê ghene hevala .

Carekadî berê simku û hemû hizira wî ma liser wan dîmenên dipencera turimbêla wî ya Bêseruruber û gelek kevin ra diyar dikan.

Liber derê avahyekî mezin û bilind,gehiştine hevalên xwe,hemû pêkve biserketin û dinav joreka biçûkda lihevlekî bune mêvan.

ew heval digel jinka xwe û birayê xwe yê biçûk,eve dûsale ketîne vî welatî,lihîviya derbaz bunê û çuna ewrupa,lê serê rêya liwan jî berze buye jiber para.

hê,hê ...eve qurbanîyên vê rêyê çendin?!

her bihustekê,her warekî her qunaxekê^ûna wan diyare !

Jibilî wan kelexên jisilupî heta ewrupa buyne mezar û şîrha wan ligelek ciha xûyaye!!

Piştî xwe dayne niyasîn,jiwê westîyanê û tirsê rizgar bûn.xwarneka gelek xweş Amade kiribun û digel ça vexwarneka direng,hevala pirsîyara cihekî kirin bu paşeroja mêvanên nû,hindek telefon û hindêk pirsîyara, birin mala pîrejineka bêseruber,joreka Biçûk û gelek pîs û bê nivîn .

wê Şevê her wekû digirtîxana "kerkukê" da,ne xew ne tenahy,tirs û westîyan biserê xwe!

Sipêdê zû rêberê wan hat,birin sûka û geriyanê hindêk telefon kirin bu birayên xwe da bizanin gehiştine kiyêf bisilametî.

Careka dî wan û bajêrê kiyêf dane ber êk,bu wan diyar kir ku hêştâ bajêrekî xudan hêzu şiyane,û şiyaye miratê bab û kala biparêzit,liser hemû dirindatiya hêrifên naziya

û desthelata rijêmên vê dawiyê û impyalizim û sistema cihaniya nû.

her kiyêf ya liser pê n xwe,lê gelek ya wa setiyaye. westiyana wê roj bu rojê zêde

dibit,pêşveçuna wê ya rawestiyay jisalên şêsta da,jiwî demî û hêrve.jiyan ya rawestiyay û gelek cara beref paşve ya çuy.liser van hemû birînara,senterê kiyêf her dem wek vîstevala ciwanyê ye.her dem jimirova cih nîne,biyanî,seyranger, mêvan,her wekû hemû lihîviya evîndarên xwe.herçende hindêk dîmenên tal diyar dibin,dema pîrejinek çend demjimêra dirawestit bu firutina nanekê,yan demê jinek wan zembîlkên gi^şî dûsê cara têkvedidit û lişûşeka vala digirit bu firutinê û kirîna nanekê

her jiroja êkê bu wan diyar bu ku jin livî welatî her tişte û ne citište!!

Jin xudan ciwanî û ciwanîeka bê tuxîb,û xudan mal û desthelate,jin xudan biçûke û rêbera mala xweye û karkere û jiyan hemû didestê wê daye.heker mêrek yan hevaleyê hebit.wek mêvanaye.her gava wê viya yê liderê jilayê dîve,jin bu cigarekê û şûşeka bîrê bisanaey xwe difiruşit!

Dinav vê hemûyê da berze bûn,xwe jibîrkirin,lê bu şev û hêştê êk jisedê ne dîtî.

Bişev hevala birine xaniyekî dî,dinav maleka dî da.

joreka biçûk dinav maleka pir mirov da,pêniç heval bune êk diwê jora biçûk da.hindêk hevalên dî man limala binî,ewa berî wan hindêk hevalên dî jî lê hebun.

Şeve û wek girtiya man diwê jora biçûk û lêkday ve.

ev male,wesa diyare ya paqij û biserubere,wî hevalê ew înayne wêrê,gute wan:

- divêt hûn rêzê bigirin,û taybet ev şeve,çunke vê malê mêvan yê heyn û ahenga wane.

Man dijora xweve hindê cara wek dîza dicune destavê û zû dizifirîn jorve.

Jiwestiyane û hizira rêkê û welatekî nû.her kesê hizirên wî bire binê deriyayeka kûr.

hevalên wî hemû nivîstin,xew jê sil bu,dîsan simku û hizira û peşmanyê dane berêk.

her çendekê xew xwe nêzîkî dilê wî dîkîjiber kenîya bilind û dengê lêk dana kupên şerabê,carekadî dûr dikevit.

Liser hemû hejariya wan.liser hemû bêkariya wan.liser hemû kul û xemên wan !nihu dilê wan gelek xuşe . ahenga wan wesa diyare. kenîya wan.stiranên wan. vexwarina wan.liser hemû tiştara...welatê wan....ax,ax welat!!

Azadî û dîmukrasî liher welatekî birengekiye her çende lihemû welata jixwîn û xebat û xwandinê pêkdiêt!

Sipêdeyeka direng jixew rabun,dîsan heval hatin û birine geriyane dinav pêlên bajêrê kiyêf û cwaniya wê da!

Kes jikiyêf têr nabit,zêdebarî heker mêvanên wî dibirisî bin!

Bu xwarina nîviru hemû pêkve limala binî kum bun.

Digutine wê malê,mala kurda û hindêka jî digutê mala mêvana û car jî digutinê,,tiranzê,,û gelek navên dî, wek liqê êk,mala xaletê,mala hemûya,serkirdayetî, dayka bê xudana

Birastî hemû nav hejî wê malê bun !jineka sîhsalî,ciwan û merd û xudan dil...

Dayka dûkiçên biçûk û xwuşikeka gelek ciwan û sinêle.

Xanîekî xuş, sêjorên mezin û lêkday,licihekî dilveker.

Piştî ewên jinû hatîn,rûniştin,wek xûndikara liroja êkê ya xwandinê .rêberî Dane niyasîn bu xudana malê . bidevekî tijî kenî û bişkurîn hate destê hemûya .û bizimanê kurdî gut:

- navê min,temara...

- çewanî? Başî?

- Kurdistan xuşe!

Devê hemûya ma beş!!

Piştî jîsilav kirina wan xilas buy, hindek gutinên rusî gutin,lê wan ne zanî ka cigut,û çu qesta jora xwe kir,ew hêlan hilawîstî biciwanî û xwîna şirîna xwe ve..

Piştî demekî kêr,wan hind dît jineka kurd,bikiras û fîstanên kurdî ve hate jor.

Kesê jiwan ne niyasî,wesa hizir kirin ku jineka kurde wek ewên tijî wî bajêrî û hemû mayne birêve.lê piştî wek,,kilawdiya şîfer,,xwe nîşa wan day û dû sê cara lidur xwe

zifiri û hati û çoy û hindek parçên stiranên kurdi gutin.

" ez nexuşim ...neserxuşm... welatê min baxçê gula luy looo... zanîn ku eve hernewa birî nihu ye !

ew hevalên berê limala wê,hemû pêkve kenîn.mêvanên nû jî digel wan kenîn,êk jiwan gut:



-eve cilkên jinka min bun,me bu wê kirine diyarî,piştî gelek harîkariya me kirî.

Jiber yariya û kenyê u xwîna we ya şirin, mêvanên nu nezanî ka çewa xwarina xwe xwarin.

Berî her tiştêkî,her kesê bête mala wê,divêt pêkekî "votkayê" bidadî.heker dê jidil sil bit.her kesê vene xut, dê biserî da kit,eve jî wek wê digut,da çî Şerim û asteng ne mînte dinavbera wê û mêvanên wê da,hemû wek heval bêne hijmartin .

Roja wan digel şeva wan têkel bun.carekadî lê bu sipêde û heşt pitir jideh tulaza digel jineka biyanî û hemû vexwarin û sergermî û jibîrçun,wek hevala man, her wekû ew jî wek wan,, nêr,,

Şerku ser lê şariya,bidengekî bilind gut:

-eve tu çitiştî?Te em ev hemû mirove şet kirin!Ma dê çî îniye serê me?Te çî jime divêt??

Piştî hevaleyê bu ev gutine guhartîne rusî,bikenîeka bilind gut:

-ez tiranzêtim....kes naburt heker limin ne bite mêvan. kes naghete Mirada heker min tewav ne kit!

Gelek rengên xwarinê,gelek rengên vexwarinê.

hemû rengên dewat û xwe hilavêtinê.

her kesê jiwan ew bûka xemlandî bu xwe diveşart .

ew jî her dem ya amade bu ,bu hemûyan,hemû wek êk didîtin,her kesê liber sîngê wî dileyzî,ew hemû heval û dustê wê bu

evê jinê hemû ser xweş kirin,jibîr û hizira dûr kirin. hindek liber sîngê wê nivîstin,wek biçûkên sava birine ser cihên wan...hindek wek peykera licihên xwe dixew cun limala wê.hindek berê sipêde çune mala serî .

Madê çewa jievro û pêve bêhna wan limalên wan êt? her piştî demekê kurt,hemû pêkve carekadî limala binî kum bun.

- divêt em gelek xwe jibîr ne kin û pirsiyara xwe û çuna xwe biken.eve ne qunaxa meya Dawyê ye.divêt em biçûkên xwe,mala xwe jibîr ne kin.

- gelek rê hene!

-her rêyekê hindêk asteng hene !

Wê êvarê xwe gehandine rêberê rêya firukê.lê gelek pare û kêma aramî û tirs û bê bawerî jî biserê xwe.

Wek mîra,liser kursîka xwe yê rûniştîye,û lirex û rwyên wî wek serleşkerekî,tijî mirovin:

- rêya me gelek xuşe,me firukxane û kuntirul kirîne. hemû polîs hevalên me ne!! -erê,êkser bu elmaniya? Yan gihurîn û qunax hene?

- êkser bu firankfurt! Bêy kes digel hewe biaxivit!

- biçend para? Ê dê çewa din?

- çar hizar dulara!nihu divêt hûn bidin.

- bawerî dê çewa hebit?heker em hatin girtin û zifirandin?

- ne.hûn naên girtin...û heker hûn firîn,em û hûn jiêk xilas!!

Bi difin bilindî,rabu ser xwe û der ket.

Bişev lêk kum bun û liser vî babetî gelek axiftin,simku û hevalên xwe biriyar dan lezê neken lê lêgeryan û pirsiyarê,berdewam bikin.

Sê hevalên wan biriyara xwe dan birêya firikê biçin,û karê xwe bidirustî bu vê çendê kirin.pare û paspurt û piştî çend rojeka dane

rê.heta lifirukê siwar bûn digel bun,lê piştî firuke bilind buy jê bê xeber bun...

Bidilek xemgîn^êrkuy gut:

-eve ew çun...lê çun ne bese,ya giring gehştine! Gehştineka bisilametî.

Serê simku dinav destên wî da bu û gut:

-erê silametî biniyatê hemû serketina ye!!

hatin ser kul û xemên xwe .guhên wan man,ka dê gehne çi qunax?Da ew jî rêya xwe bizanin!

-heker bisilametî gehştin!em jî dê dine bidûf ra!!

-heker ne gehştin?!

-heker negehştin!eve em man lihîviya firyê gay!!

Piştî çend roja zanîn,hersê hevalên wan digirtîxana kiyêv da digirtîne!

Man sê heval diwê jora biçûkda,cihê wan pitir xuş bu .

Xudana malê zanî hindek hevalên wan çun,kiriya jora wan jipêncî dulara kire çil dular,bêy ew digel biaxivin.

Man divî rengî da,her heval û birader yên kum dibin,û her mêvanên wan yên zêde dibin .

ew jora liser wan da bu seyde ehmed û jinka wî girtin,ew jî înan nik xwe

Joreka kême pare û tena û nêzîkî wan.lê beramber xizmeteka gelek bisanahî !!

-ez mirovekî nivêjkerim!Dê çewa karekî husa kim? Were vê dawya jiyê xwe seyekî Xudan bike!û bibe destavê û yariya! Vêca heker se jî ba bila,nê ne seye! Dêhle seye !

evejî bu êxbala mine!

- xudana malê çî pare nevên!Tinê divêt tu vê dêhle sey xudan bikî,rojê sê cara bibye derê.

her roj sipêdê zû,seyd ehmed,nivêja sipêdê digel dû sineta dikit û hefsarê dêhle sey digirt berev baxcên dinava wan ciya xanêna da diçit .birêve dibu pist pista wî Û bu xwe duwa û laveyî dikirin!

"hê hê, eve ezim buyme şivanê dêhle sey?ezim husa bê xudan û bê biha buym?

ez bum xelkê gundî,xizmeta min dikirin.her pêniç demên nivêja lipişt min rêz dibun!

her ^tê min gutba,hemûya bawer dikir,her ^tê min viyaba hemû diamade bun biken,geleka Jî bawer nedikirin ku ez dicivata wan da dirûnim!hê hê, û nihu û nihu ez"

Dengê dêhle sey hizrên wî belave kirin û rewî. seyd ehmed baş fêrî zimanê wê buye.

Nihu wê divêt biçite mal û demê xwarina wê ye!

Seyd ehmed çavên xwe lidurxwe digêran,ka kes wî na bînit?Ka kesê ageh jiwî nîne?Kes pê nakenit?

Lê wî ne dizanî ku seruberê hevalên wî gelek jiyê wî baştir nîne!!

Wî nedzanî her dû Mamustayên berî çend rojeka hatîn vî welatî,bihayê mana

wan,bihayê jora ew têda,tinê mvina wê pirejina xudana malê ye

Wî ne dizanî gelek hevalên wî,eve çend salin livî welatî,  
nanê"nêrîniya"xwe dixun....!

Wî gelek tişt ne dizanîn,lewra her serê xwe dihejand û digut:

-heker jiber wê nesaxiya ez jibu hatîm,neba!ez da zifirim.eve ne  
cihê mine ,eve ne Şula mine!

Simku û hevalên xwe her man lihîviya rêberê wan axivtin di gel day  
û wî jî peyman day bierzani wan derbaz bikit .

Lê kîro bu,çend carekê telefuna wî dikin,yan telefuna cêgirê wî  
diken dibêjit:

- van roja dê êt,dê hewe hemûya pêkve derbaz kit,rêya me gelek ya  
êmne û bisanahye!

Pişt rast dibun,bêhna wan fireh dibu,digêleşuka jiyanê da carekadî  
berze dibun

Karê xwe kirin û cun seredana wan hevala bidin,ewên hêştâ  
digirtîxana kiyêv da.

Simku û çend hevaley çun,gelek xwarin û tişt bu amade kirin,gelek  
xwe wastandin,Lê ne hêlan wan bibînin.

Polîsekê gelek dijwar û bê dil,digutin:

- ev mirove livêrê nînin,heker hûn ne çin,dê hewe girin!

Seruberê girtîxanê,wek girtîxanên welatê wan bun, û hêştâ  
dijwartir,pîsatî,Û birs,û tirs,nexoşî.dirindatiya polîsa.reng û bêhna  
girtîxana "basitîl"û"ebuxirêb"jê dihat....

Bêhna simku teng bu,gelek bîrhatin dihatin bîra wî. diviya bizûtirîn  
dem jivî cihê dûr kevit!!

Şeq şeqa seqata,dengê dijwarê polîsa,nalên û qêryên girtiya,duwa  
û hîvyên heval û dayk û baban, pîsatî, rengê pirsî,tirs,jor û qulaçên

tarî.simku hêr kir,bire nav destên mirov xora .nav destên dujminên mirovayetyê da.

"destên wî asê digirêday bun..çavên wî bipatekê reş di şidandî bun..pên wî diqeydeka

giranda bun..leşê wî reş u şîn bu..xûn jibirîna diza..serê wî giran û wermî bu.. çi didan didevîda nemabun..çi nîluk ne bun xwe pê bixurînit !"

hevala milê wî girt û jiwê xewnê hişyar kir,liber dergehê serekî yê girtîxanê,zanî ew zifiruka ew têda ne ma.ew rojên ne xuş neman .nihu jiyaneke diye nihu mirove. nihu azade !!

Bi wan serudilave zifirîn. piştî gelek cara hewil dayn û gelek cara çuyn,lê her Axivtina wan êk bu û ne hêlan hevalên xwe bibînin.

\*\*\*

"Binavê yezdanê mezin.

Birayê gelek xuştivî û hêja simkuyê berêz.

hîvîdarim gelek hewil bidey harîkariya me bikey,û me jivê duzexê rizgar bikî.

Çinku me gelek bawerî bite heye,dê her ^tê te pêçêbit bikî,dê bu me kî,lewra em hîvîdarin tu gelek xwe biwastîni û para bidî heta me rizgar bikî .

Seruberê me gelek ne xuşe.ev millete gelek jivan milleta dijwar tirin,ewên welatê me dagîr kirîn.

nihu em dinav mafiya û diza û tiriyaqçiya danin.

Lidawyê hîviye mala me bizanin ka em likîvene ....

Birayên te1....2....3....

Girtîxana kiyêf"

Vê namê ku liser kaxeza tewalêtê nivêsi bu, dilê simkuy sut, gelek bu wan giriya. ne nivîst .xemên wî zêde bun. ma hilawîstî, çi jê ne dihat .lê nabit husa van hevala bisanahî jidest bidin!!

Carekadî gelek xwe wastandin. gelek mirova jî harîkariya wan kirin, lê ne şîyan hevalên xwe bibînin, û çi tiştê bu wan biken .

bu kul û ma didilê wan da !!

Roj yê diburin û hêştê rojane, sipêdê diçine bazar û geriyanê û bişev limala binî, mala temarayê kum dibin û xwe jibîr diken. rojane hindê kesên dî ji Kurdistanê dihatin û liwan dibun mêvan. dîsan şevên xwe jibîr kirinê bu wan jî amade dikirin .

Digel wan hevalên vê carê, stiran bêjekî temburvan hebu, wî şîya wê şevê hemûya rakete ser piya, û car jî ser desta. serxuşî û xwe jibîr kirin heta berê sipêdê.

dengê tembura wî guha disimt.. bejna wê kiça lidestê min dila disimt.. ewê birex minve, wekû derwêşa yê serê xwe dihejînit û çi jê naêt !!

ewên berî me tewav kirîne vê beytê , yê yariya digel pelatînkê dîkin!!

Temara bikiras û vîstanên kurdîve, ya dila aşt dîkit.. xilweya dîket.. perdaxa dadigirit.. sersipî û bira zava ye !!

ewên evro hatîn, sund xwarin ne çine wê uxera jibu hatîn wil vêre akincî bin!! Nexuştirîn çirke ewe, dema %ekên şerkerî nemînin!!

Vexwarina wan nema. hevalên wan wastiyên .roja wan serê xwe hilda .dergehê wan hate qutan !!

-hilun karê xwe biken da bidene rê.

Digel sipêdeyeka direng, karwanekê dî rêya xwe dîtin çun.

Simku û şêrku man, digel dû hevala limala binî .

her rêberê wan yê wan gîru diket, û her yê bixwe ve girê didit, ew jî man lihîviya wî jiber erzanî û niyasîniya wî.

" Limin bibure, limin bibure yara min, ew gustîrika te bu min kirê diyarî liroja xwastina te, min êxist, limin bibure , ev welatê ez ketîmê, welatê jinaye, jin hemû tişte û ne çi tişte !!

Limin bibure, dest û darê vî welatî em yê jigelek bîr û baweriya şuştîn! hê hê ..eve welatê lînîn û markis bu ..eve welatê çîna pirulîtariya bu..çilê hat?!

Dê kîve çit?! Jin bu şûşeka bîrê xwe difiruşt û mêr bu cigarekê....!

Mêvana min ya vê carê, jiciwaniya we ez têr nabim, wê ji jidil ez yê bu xwe girtim, û ya

liwê bawerê, ez dê mînime

livî welatî, û dê bu wê bim mal û mêr !!

ew nizanit, ez kewekê kwîvî me û bu kesê na qebim. heker lateka çiyayê welatê min nebit!

hêdî hêdî xwe dinav vî milletî diqutan, heval bu xwe digirtin, têkeliya wan dikirin, pitir bêhna wan fireh dibu. ezmanê wan bisanahiye, wek jiyana wan, têkelya wan digel biyaniya ya bisanahiye, jin pitir ya kwhiye jimêra. hevalîniya wan gelek ya bikeyfe . digel hevalê xwe gelek bibawerî ne, çi fêl û find linik nîne, hevalîniyeka jidil dikin.

ewa hinde sala liser jiyana wan xwandîn, dipertuk û guvaran da, êk jisedê livî welatî ne dîtin!!

her êk jiwan hevaleyê bu xwe girt û demê xwe digel diburand. lê jiber dirêjiya demî û têhna wan ya guhnêlî, gelek jiwan dûsê heval



digirtin,û gelek cara linêçîrên asê digeriyan.da wê hişkatiya jiyana salên gencatiya xwe nû bikin û carekadî jinû û birastî Bijîn

Ciwaniya jinê .. sanahî û erzaniya jiyana..hevalîniya kiça.hemû xaf kirin,rê liwan berze kirin,gelek jiwana ne diviyan vî welatî bihêlin .gelek bun xudan mal û biçûk, gelek bun êxsîrên kiçeka ciwan!!

ew salên wan burandîn liwelatê xwe ,hevalînî û dîtina kiça,wek bêulyekê bu !

Liwan hîvî bu,destê kiçekê bigirin.yan kiçekê biramusn!!

Jin,kiç,wek kelheka asê û pîroz bun.kesê ne dişiya nêzîk bibit.ew dizî û veşartin yê hindeka dikirin,dibune jehir, gelek cara kuştin û xwîndarî dijwar dikirin.

Gelek dibune qurbanî jivane kê,ramusanekê,xilweyekê. gelek cara ew hevrikî dijwar dibu,gund û aqar dihatin sutin.çitam nedima diwê ramusanê,wî jivanî !!

Livî welatî,ne hevrikiya êlî ye,ne Dijwariya ulî ye,ne cawaziya çîneyetî ye.biheştî çil hurî ye ...

yên buyne kewgîrên şareza,lizuzana,li warê kewa.ew birsa wan.ew têhna wan .ew hişkatiya jiyana wan.nihu yê livan zuzana pezê xwe diçerînin .

Limala bini,mala temarayê,yê runiştiye,xemên wî ser yê lê wermandi,ew votika şivêdî vexwarî hêştî ya liser hizrên wî zale.car jidurhêlê xwe dûr dikevit,car jî har dibit ,jikevlujankê xwe derdikevit û nêratiya wî dijwar dibit.divêt biher renekî hebit,dinav nivîna jinekê binivit. yan heker dê dîn û har bit,serê xwe lidîwara dit.

her wekû ne ew bu heta berê sipêdê nivîna wî ya gerim bu.

-hewar,min jin divêt,jin, jin...

Temara, ya dikuşa hevalê xwe eyad da, eve şevêk û rojek biser wan da burîn, heştê wek bûk û zava jêk têr ne buyne .

Dengê we yê niv nivîsitî, bêhna votikayê jê difirî, gut:

- te jin divêt?!

Pêtivî ne bu berê xwe bidetê ka kî bu, simku zanî dengê temarayê ye . didlê xwe da gut "dibit dilê wî bimin sutbit, û nihu çend çirkeyeka bête dikuşa min jî da"

êkser gut:

-erê min jin divêt, bila ya pîr bit, bila ya kirêt bit, bila hizar eş lê bin!

Temarayê bidilek sax û jidil pêveyê ve gut:

-eve jina hevalê te ya amadeye dijora heve !eve pitir

jisalekê ye mêrê wê çuye ewrupa û ya hêlaye livêrê û heştê we zelam ne dîtiye linav nivîna xwe! Bu tu naçî wê jî razî key û bela xwe jime jî ve key?!

hemû man guhşur û hêbetî .bê dengiyê jor tijî kir.

heştê cihê hizira diserê eyad da ma bu .zanî kêr gehiştê ser hestî.

temara jikuşa xwe havête der û lê xurî :

- baş bizane, jinkên me ne êvelîne wek te !

eve ne karê wane .heker hizar sala bê mêr bimînin!

Temarayê dengê xwe jiyê wî bilind tir lê kir:

-ez êvelî me yan hûn? eve çend salin ez ya bê mêrim, min çi heval nînin .her ^tê ez bikem, bu min diriste. lê hewe hemûya jinên xwe, biçûkên xwe, mala xwe hêlayne û hatîne bidûf "binê" xwe ketîne .ez êvelî me yan hûn?

hûn hemû êvelîne ,hûn hemû bêwijdan û bê namusin. ez bitinê ya liser heqiyê!!

Kenî tijî jor bu,lê gelek nema .cihê keniyê bu enyên girê û hizirên kûr.

Gelek diwan hizirên kûr da,ne melevan bun,hizira ciwaniya jina xwe dikirin .

"erê eve pitir jisalekêye min hêlay bitinê û bê mêr?

erê bu em şevê bê jin na hewin? Û gelek şeva dûsê jina dicerbînîn,erê,erê erê????

Şêrku serê xwe dihejand û dibişkurî .diserî da kasêta suvî emer û xecê kar dikir,

demê sipêdê zû babê wi digutê:

-here ser kaniya gundî bu min mesînî tijî av bike,bu nivêja sipêdê.

Wî jî mesîn dida ber sîngê xwe yê biçûk û qesta kaniya gundî dikir,her car didît,Xeca mistu xilweyî û pistpista wê ye digel sufî emer û dicun nav kavlên kanyê .

Piştî wê kenî xilweyê,xecê qesta gundî dikir û bêy nivêja xwe bikit .suvî emer wê

sermayê û berê sipêdê serê xwe dikaniya gundî da dişuşit û jinû nivêja xwe dikir. Çend cara digute babê xwe :

- bu sufî emer her roj sipêdê zû serê xwe dişut ?

Babê wî digut:

- kurê min,suvî emer mirovekî gelek xudan îmane, û xudê niyase ....

Lê piştî xeca mistu ketiye nav nivîna û xudê cutek kura dayê .

Wî ne dît suvî emer sipêda zû serê xwe dişut!!

ev pirsiyare ma diserî da .bu çî nihu sufî emer serê xwe na şut??!!

ev pirsiyare dubare dibu,taybet dema jinkên gundî di kenîn û digutin:

- piştî duwazde salajinû cutek kura îna ??
- xudê dizanit ka jikîve hatîne??
- dayê,mistu her roj lidixtura bu.dibit dermanek lê hatbit !!

Lê demê nivêja eyşa bidawî dihat û hemû gundî lidur sufî emer kum dibun,wî digut:

- çî tişt bêy xudê nabin.rehma wî gelege.hewe dît biçavê xwe,çend dixitur û çend hekîmên vî welatî mistu ne hêlan û çî çare bu xwe ne dîtin!Lê rehma xudê biçend duwa û laveya,cutekî kura xudê dayê ...

xudê bu hizar salî bikit

hemûya pêkive serê xwe dihejandin û bilêvên qeşavî ve, dibu pist pista wan .

- aamînn...

Piştî çend rojeka biriyara xwe dan.rêberê xwe bigihurin, piştî zanîn hindek kes dirêya

wî da hatin girtin û rêya wî ya bê bawere.

Lê bu cara dawyê çune nik rêberê xwe.ku hatibu mala hindek hevalên wan,ewjî karwanên wê rê ne,lê jiber nexuşya jiyane,her êk jiwan hevaleyê bu xwe girtye û dinav pirça wê da xem û xerîbiya xwe dikujit.

Gelek jiwan hevala xudan şîyan bun,liwelatê wan,diviya ba sê car rojeka mirovî xwe wastandba heta şiyaba dîwana wan bibînt!!

Qelemê wan gelek girê ve dikirin.axivtina wan gelek gewrî têr dikirin.keniya wan gelek êş dikuştin!

Nihu yên buyne êxsîrên pirçeka zer û dû çavên şîn!!

Dîwana wan tinê,mê diçinê.qelemê wan tinê liser sîngê kiça dinivîst.axivtin yên,Jibîr kirîne,keniya wan bêhna votkayê jê difirt.nevên kes liwan bibite mêvan. mêvanên wan ditaybetin.

ew hevrikiya dişureş û berpirsaryê da,nema.

nihu hevrikîeka dî ye.hevrikiya ciwantirîn heval. xuştirîn votka.çerandina gelek kuza.jibilî hindê çi jikesê naêt

hemû yên mayne lihîviya nêçîreka nû!!

Rêberî hemû hizir birîn û gut:

- gelî bira,heker hewe rêya baş û êmin divêt?Bawer biken ez dê piştî çend rojên dî Bu hewe misuger kim.

lê divêt bêhna hewe ya fireh bit...

Wek "maraduna" pirça wî ya reş û çavên nêçyrvana,her wekû serukê mafiya.lê bidil û zimanekî şareza hemû razî kirin.

Şêrkwî neşiya xwe û gut:

-erê Mamusta,tu wek rêberê serekî,û me jiroja êkê û heta nihu xwe daye digel te,û eve pitir jisê heyve,em ketîn van kulana.wek em dizanîn rê ne maye !

Te çi hîvî û umêd hene? Ê heker hebin,heta çi rade silametî heye??!!

- ya êkê,ez jidil daxwaza lêburînê dikem,ku hûn gîru bun...ya duwê min gelek tişt kirîne û dê kem,jibu misuger kirina rê..bawer biken her wekû hûn liwelatê xwe,wesa bisanahî hûn dê derbaz bin û min liber pitir harîkariya hewe bikim.

-heker wek welatê me bit,eve xwelî bime wer bu,û em ne çun!!

Bikenî û suhbetê roja wan bu şev .

Lê dilê wan razî nebu,û her lirêyn nû geriyan.

eyad û hevalê xwe,piştî pitir jidûsala livî welatî .

xwe bu rêberyê amade kirin:

-em dê bine rêber û xelkî derbaz kin!

Bu cara êkê peywendî digel rêberê serekî kirin. pştî çend roja gelek kes birêya wan derbaz bun.peywendiya wan digel rêberê serekî mukim bu.

Simku û şêriku jî gelek harî wan kirin,û heval birêya wan hinartin !

Dinav xwe da kirine râber,piştî ku jibê parey mabun birêve!

evro jî deh kes bisanahî derbaz bun.berdewam hevala kum dikin,û her çend rojeka karwanekî derbaz dikin.

Simku û şêrku jî biriyara xwe dan,digel rêberê nû derbaz bin.piştî biçavên xwe dîtîn ,ptir jised kesa diçend rojekada derbaz kirîn.

Bu cara dawyê hewil dan wan hevalên digirtîxana kiyêf da bibînin,neşyan û rê nedanê!!

Sipêdeyeka zû jixew rabun,piştî wê şevê biriyara dirustî dayn û hemû hevalên xwe pê agadar kirîn.subehî dê digel rêberê nû dene rê....

Limala temarayê hemû kum bun,gelek heval û birader û kesên dî jî hatin.

Ya jihemûyê nexuştir,neşiyar xatira xwe jitemarayê, xudana mala binî bixwazin .

Wek daykeka dil sutî,wê şevê heta sipêdê ew ya giriyay. eve karê wêye,çend mêvanên wê mala wê dihêlin... taybet van mêvana ku hindêk jiwan pitir jidû sala limala wê bun,wek malekê lê hatbun !

Simku kete beramberî wê jinê,bîra dayka wî hate bîrê, ka çewa girt û ber ne da lidemê xatira...

Simku da bersîngê xwe û şidand,heta hevala bixurtî jinav destên wê îna ye der.her wesa hevalên dî jî girtin û bizurî berdan .

Dîsan xatir xwastin û dîsan qunaxekadî.piştî ev ware baş çerandîn,kesê ne diviya bihêlit.

Rêberî û hevalên xwe,bu wan turimbêl amade kirin heta westgehê tirênê.

Rêberê wan yê vê carê,hevalê wane.eyad û dû heval bune êk û xwe bu vê çendê jidil amade kirin.

Berî bigehin wan turimbêla,turimbêleka polîsa liber rawestiya û daxwaza nasnama jê kirin.

Piştî gutîn,em kurdin û me çî nasname nînin. bibişkurîn û silava dawa lê burînê kirin û hêlan û cun!

Dilê wan bikurdîniya wan geş kirin^ştî rû û qîmet yê may?!

Yan jî jihejarî û karesatên waye?dilê wan pê di sujit? lewra berdan?

Liwan tirumbêla siwar bun heta westgeha tirênê .

Westgeh jimirova cih nîne her wekû xelkê vî bajêrî hemû dê hêlin û bidûf wan Kevin.tijî hemû ciha mirovin. tirên tijî mirov bun.hind siwar dibin,hind diêne xwar. jiyân dikupika livînê daye!

Wan kiçên ciwan,xwe pêşçav diken û limêvana digerin. bihêceta jorên betal bu mêvana.

- me joreka gelek paqij û ciwan ya hey !

- jora te biçendê ye?

- bikeyfa teye!

-erê jor bitinêye,yan tu jî digelî?

-ewjî her bikeyfa teye!

Bazara wan,bira kirin û firutina pezi likurepana sêmêlê ya pezi duna bira wan.

ew kiçên hind ciwan û jêhatî,bu çend dulareka xwe difiruşin!

eve ew û kiç jêk xilas.nihu bune êxsîr didestên hindek rêberên mafiya da!

Tirsa wan digel wê livîn û kuma mirova têkel bun! polîs û tirsaw jibîr kirin!

her dûsê kes bidizîve siwarî tirênê kirin û kesek jirêberê serekî da digel wan û pitir jisîh kesa û beref tuxîbî dane rê.

Tirêneka gelek mezin û dirêj,pir mirov,her dûkes jiwân dijoreka biçûk da digel xelkê dî da bêne berze kirin.

Tirs u be baweri u reya direj u tiji asteng u nexuşi u paşeroja berze. eve hemû bibun heval û dil lê dagîr kirbun.her sipêdê dabune rê U şev bi serda hat û

her yê amujgarî û fermana jirêberê xwe yê nû werdgin.



- gelek ne axivin...gelek hatin û cunê nekin...bila kes hewe ne niyast...bila kes nizanit hûn dê kîve çin...

Simku diviya şeva xwe kurt biket,gute Şêrkuy:

-eve em yê beref qunaxeka dî diçin,heker silametî hebit!

-erê ya giring silametye!

- te çewa ev welatê me hêlay didît?ez vê pirsiyarê dikim,da şeva me pê biburt,tu dizanî em dê subehî êvarî gehin bineciha xwe??

Şêrkuy wek rojnamevanekî şarezaxê xwe xuş kir U gut:

- bidîtina min,ew pêzanînên min liser vî welatî xwandîn, liserdemê susiyalîzmê,û ew pêşketina min hizir fikir, birastî min çi jê ne dît.jibilî hindek avahî û mîtiru û hindek cihên mêjoyê....

Simku eniya xwe perxand U piştaxê xwe da dîwarî û gut:

-ez dibînim,êk jisedê ewa me hizir fikir,ewa me dipertuk û guvara da liser dixwand,me ne dît,lê hindek tişt mayne U şayne xwe biparêzin,wek te gutî, cihên mêjoy o mîtiriya bin erdî û baxce û hindek ^tên kê. milletê wan,te çi têbînî liser milletî hene?

- milletekê hejar û bê bela,gelek jipolîsa ditirsin. hemûya divêt şul biken,lê ne şule û ne tenahî.

ez bawer dikim ev egere dê vî milletî tuşî hindek girftaryên mezntir kin,heker bizûtirîn dem ne êne çareser kirin.ya jihemûya girinktir,tirsa wan jipaşerojê, û tirsaxê wan ji "çêrnublê"

Simkuy dengê xwe nizim kir U bibişkurîn ve gut:

- û jin ? Te çi têbînî liser jinê hene?

- jinê pitir jizelamî mav heye,jina ukiraynî ya zîreke U xudan Şiyane,lê ewjî ya bê desthelate ..

- bişkurîna simkuy bu kenî û gut:
- ciwaniya wê?Bê bexyê neke?!heta çi rade ya ciwane?
- birastî ciwaniya wê ya bê tuxîbe !Li ser wê ciwanyê ra ya dil sax û dil nehêle... her duwa zanîn kenîya wan jituxîbê azadiya wan derket. pştî peyva xwe bidawî

înay,devê xwe girtin û carekadî zifirîn didwî seruberî û bê dengye.piştî demekî xwe ji bîr kirîn.

Tirêna wan her ya jirê û jidemî dibirt,bêhna wan ya teng û ^ê wan yê westiyay,yê lezê dikin.

Serê simku kete ser milî û êdî ageh jihevalê xwe nema.

"seyên har û didan tîj,yê wan kelexên mirova didne ber leqa,ewên nîv sax û birîndar,yê liser zikî û ser teniştta xwe jikuma sa dûr dikin û beref wê bilindahya ew liser diên,ew yê hercar destê êkî digirt û dihelkêfte birex xwe ve .

lê çend êk biser dikevit,cih teng dibit.ewê vê carê jidevê sê car sa qurtal kirî,birîna wî Ya kûr bû.destmalaxwe havête birîneka wî û girêda.lê didanên wî jididanên wan sa hemûya tîj tir lê hatin,û ketine ser riha stwyê wî û şidandin. deng jê ne hat,ew birîndarên wî jimirinê û jidevê seyên har qurtal kirîn,hemû bune devên beş û didanên bixûn û leş lê hêran.

hindî hewil da bikite hewar,neşya.kes ditana wî ne hat. lê jidûr û gelek jidûr...dengê dayka wî dihat û digut:

-heware,heware,kurê min jidevê seyên har qurtal bikin heware..

Digel wan hewar û gazyên dayka wî,gelek kesên dî jî, dar û gupal hilgirtin û berev cihê wî dihatin,liwan sa dikirine hewar û dar û ber tê werdikirin.

hemû direvîn,tinê ewê stwyê wî didevîda razî ne dibû, stwyê wî berdit .heta dayka wî biwî gupalê didestîda û bihemû hêza xwe,serê wî sey da ber gupala,û gupalek bişaşî biserê kurê wê jî ketî û rast rabu ser pêt xwe ..."

Tirêna wan ya rawestiyay û heval yê karê xwe dikin û eve gelek cara hewil dan wî jixew hişyar kin,lê bê hiş bibu,heta şêrkuy destê xwe licihê gupalê dayka wî day

-hilu em gehştin....

" eve pitir jiçar sale ez gehştîm !

Min çi kirîe ?ez lihîviya çi me?

heta kengî dê divî halî da bim?

ez lidiniyayekê,û biçûkên min lidiniyayeka dî!!

Xuşya van welata çiye?

Raste tenahye..erzaniye..xuşye..dadperwerî..mav û jiyaneke mirovayetî..xizmeteka dirist diken...

lê ez jiber vê çendê nehatîme ,ez jiber xwe bitinê nehatîme.ez jiber biçûkên xwe hatîme.heker ez livêrê û biçûkên min liwêrê .eve ne hîviya min bu.eve heta kengî dê kêşit??

Dawya vê xwe ragirtinê kengiye??!!

ev barê giran dê heta kengî liser milên min bit??

eve min destên xwe bilind kirin!ez hind dişêm.min hêz û şiyar neman.ez ketim bin piya .min bese jiyan .min bese jiyan !! "

Gehştin bajêrê "sivaliyava"rêberê wan êk êk,dûdû, jitirênê dizîn û liwara belav Kirin.

Dîsan tirs û jivan û paşeroja berze.ew mirovên liwara wek hêbetiya tê difukirîn.

Piştî demekî neyê dirêj,kurtulazek hat û bizimanê rusî navê rêberê wan îna û gute wan:

- dû dû digel min werin...

Lê bu rev û bez,her kes xwe jiyê dî zûtir bigehînte turimbêla wî ya amade.

hindek turimbêlên dî jî amade kir bun.ewên berê gehştîn cihê turimbêla siwar kirin û beref berzebunê.

her ciwar kes digel turimbêleka taybet da û dirêyeka cudara birin.dîsan hizira birine gelek Rêyên girtî,mafiya, diza,girtinê,polîsa,gîrubunê....

Bîra mêrkuj û polîsên welatê wan dihate bîra wan.

Dema bişev xelik dibirin û berze dikirin û bisanahî gunhebar dikirin.

Piştî demekî kurt,gehandine avahyekî biseruber û lêkday û maleka dirust û bê

kêmasi,tinê mirov yê jê derketin.

Diyar bu,eve bajêrkê "uşgirade"liser tuxîbê siluvak,tena rûniştin,xwe veşelandin,eve çend roj bun gelek diwestiyay û bêhîvî bun.

hindek hevalên wan gelek gîru bun,vê çendê jî care kadî ne rihet kirin,lê piştî demekî dirêj,kum kume hatin û hemû careka dî liwî avahî kum bun.

Jin û biçûk birine rexeke dî,bîst û êk kes man diwî avahî yê dû jorîve,û ew jî bune dû cûn,wek hemû jiyana wan..

Neh kes ewên xelkê duhok û dewrubera,man divê jora vî rexî  
ve.ewên xelkê hewlêr û Silêmanî û derubera çune dijora rexê dî  
ve.ew jî bune dû cûn!!

Geleka wesa hizir fikir ku cudabun tiştêkî rewaye !

Lê licihê wan û likawdanên ew têda?

Cudabuna wan birengêkê utomatîkî rûda.

her çend kesek hevalên êkin,û jidurhêlekî hatîne,dibit eve demekî  
dirêje pêkvene ?

Lê dema cudabun dibit aydulojî...dibit kerb ûkîn...dibit  
berjewendî...dibit peyrew... Liwî demî,neman û qirbuna gela dibit  
xelat...!

Taybet heker cudabun dinavbera milletekî dabit,ku bihemû renga  
serusîmayê milletek êk girtî heye..êk xak û êk welat û êk ziman û êk  
paşeroj .

Roj bu rojê tîka cudabunê ya firhe dibit!!

Roj bu rojê goşt yê jihestî vedibit!!

Roj bu rojê berjewendiya taybet ya biser dikevit!!!!!!

Xwarna wan,axivtina wan,hemû dicudabun.hindek cara hatin û cun  
dinavbera wanda hebu,lê her dicuda bun.

Cudabun...

Cudabuna hizrubîra...!Cudabuna bejewendiya...! Cudabuna  
armanca...! ev hemû rengên cudabunê direwane.0

erê,bu dê cudabun hebit,heker armanc û berjewendî êk bin?? erê  
diwê gavê da ew cudabun dê dixizmeta kê da bit??

em her dû kes dicudane .hizra me,rabîn û rûniştina me, gelek cara dibin êk,lê her em carekadî cuda dibin.

Kempa me ya dinîveka bajêrî da,em pitir jidehe kesa dijoreka bê seruberda.

heker eve kempeka dewletî bit ya husa,pa me çewa libajêrê ser tuxîbî û rêya qaçax,Pêkve burand??!!

em pitir jibîst kesa bun dixanîekî dû jorîve,di seruberekî gelek bitirs û nexuş da.

eve wesa diyare ku millet hemû dibaşin...!

tinê desthelatdar nexuşiya peyda dikin,da her bimînin!!!

\*\*\*

her êk jiwan berî yê dî,bu xwe cihekî xuştir bigirt,û karê nivistinê bikit.

Wesitiyan û tirs û birsa çend roja jibîr bikit.

Piştî birs û wesitiyana wan verevî û binece bun.

jora wan,wek hola Kungirê partiyeka ne rêkxisitî û sava lê hat.

her êk û hizrubîrên xwe û lidûf zanîna xwe,dîtin û buçunên xwe bu wan diyar dikirin.

eve karê vî milletiye,piştî hevalê xwe diniyasin,êkser babetên ramiyarî digel ve dikin û dibite şere deva hizrubucuna.

ew jî bidirstî nimuneka biçûk bun jimilletê xwe yê mezin.

Dû se rwşenbîr,dûsê jibine malên axa û derebega,dûsê jipartiyên rêkxisitî .

ewên dî jiçîna hejar û bê layen.

Lidestpêkê kur axa ser jihemûya standin,û jiroja jidayk buna xwe û ya babên

xwe,heta wê rojê.dû sê carî bu wan vegîra.

- babê min pitir jibîst gunda hene ! Xanyê me bêlaye ,herkaşiyek jirengekiye !! her sal babê min turimbêla xwe digihurit û nûtirîn û bihatirîn turimbêl dikirit! !

Çi dewlet nemayne,wî ne dîtîn !! Babê min...babê min!!!

- bine mala me,gelek dinavdarin,bimêranî û nanê xwe. xulam û xizmetkarên me,naêne

hijmartin.avahî û aqarê me naêne pivan û keşan.ez nizanim,ka me çend malê diniyayê heye !! Û ...û... !!!

Lidûfra wan hevalên dipartiya da rêkxisitî,simînarên taybet dan.

- partiya me,ji bu berjewendiya milletî hatî qadî. partiya me partiya gel û hejaraye.peyrew û pirugram dixizmeta çîna bin dest û hejare. partiya me ...û...!!

- pêtivî nakit ez behsê partiya xwe bikim!

Çinkî ew partiya hemû milletî ye .çicar jiqada xebatê dûr ne ketîe .û çicar xiyanetkarî ne kirîe ..û çicar dest jimafê rewayê milletî bernedaye,...û....

Lê van her dû cura çî guhên vekirî û bêhnên fireh ne dîtîn.

Jiberfirhya demî û be karî û rûniştina wan licihekî biçûk, hizirubîrên bê binecih û xapînuk,zû berze bun,û cudahya çînayetî nema!!

Nivistina wan liser erdî,xwarina wan hêk û nan.tirsa wan êk,paşeroja wan pêkve.

lewra diêkbuneka sar da bun.car jî dijatiya hizirubîra digheşte pila xwe jibîrkinê û xwe kuştine,^ bêhna firehya hindêk layena û tirs jipaşeroja reş,dişya seruberî carekadî ragirt.

Kes nema diwan roj û şevên pêşyê da,jiyana xwe û hizir û bîrên xwe,dubare şiruve nekirîn.

Lê roj hêşta yên mayn,û şevên dirêj bidawi naên!!

saşa..rêberê ros yê serekî,evro hate nik wan,birastî mafiya ye!!

Seruberê wî,axivtina wî..

Digel wan rûnişt û gelek bu wan axifit û belên da ku diwan rojên bêt da hemûya derbaz bikit.

Pitir tena bun û hest kirin ku ne jibîrki ne,û hindêk hene pirsiyara wan dikin!

Careka dî şevên xwe biaxivtin û yariya perkanê û tewlê ve burandin,û car jî hevala setrinc dikirin.

Lê her şev û rojên wan didirêj bun.

ew biraderê jihevalên xwe vebuy bidil mayî û jijora dî qesta jora wan kir,bidilekî firhe xudan kirin.

Wî suhbata xwe dest pê kir:

-eve cara şeşêye,ez xwe livan rêya didim û derbaz nabim !

Cara dawyê ez hatim girtin,û eve şeş heyv bun ez digirtîxana kiyêf da...

Polîsên wan gelek jipolîsên me dijwar û bê dil tirin!! hêşta wî suhbata xwe bidawî ne înay.ewê birexve gut:



-eve sê salin ez birêve ! Û pitir jidehe cara min ya xwe livan rêya day,dawya wê girtîxaneyê,yan zifirandine,û her parê hebit polîs dê jite sitînin!

Birastî van axivtina dilê wan xaf kirin,berxwedana wan sist kirin,tirsa wan zêde kirin.

Carekadî simku dibire ber landika sava û dayk û babên pîr û nesax.

Lê êkî dî jivan rûniştîya axivtina wan digel tirsê wan birîn û gut:

- pa hûn bu min çî dibêjin?!eve dû salin,min jinka xwe digel dû biçûka hinartî û ez mayme birêve û ew bitinê lixerîbiya.

Êkê dî nehêla ew xema xwe bidirustî diyar bikit û gut:

- xwezî bicûkên min jî gehştban binecheka tena,bila ez deh sala livan kulana mabam!!

Lê ez divê duzexê da û ew jî yên mayne birêve,û diduzexeka diwartir da.liwêlatekî birisî,nan nîne bixun. û destê kesê jime nagehtê!!

ew hevalê wan yê sere,û hemûya rêz bu digirt,gut:

-hîviye ev axivtine hewe bê umêd nekin!Raste gelek birêve mayne,û tuşî nexuşya buyne,lê gelek hene her cara êkê derbaz buyne,bêy çî nexuşya!!

Wesa diyare em dê bisanaey derbaz bin !!

Bê dengiyê guhên wan simtin .pştî ku gelek dinav hizir û xemên xwe da xendiqîn . Dengê wî kur axayê bu wan xwarnê amade diket,hemû hizir birîn û gut:

- werin xwarnê bixun,ma hewe divêt ez bikeme didevê heweji da?

eve jiroja êkê,ew yê bu wan xwarnê dirust diket,digel hevalekê dî,û jigelek jinên bermala baştir!!

Wek wî digut,jiyana xwe hemû ya dijora xwarn çêkirinê da burandî û hemû rengên xwarnê baş dizanit.

Wek girtiya rêz bune cihê xwarnê,her êk liser pêyekî û nîvrûmştîjiber cihê teng.dest dane xwarna xwe ya rojane.her hêk û nane,car jî birinc û afka sure,yan nan û maste.

hevalekî gut:

- ma hûn jihêka zêdetir nadene me?Nê çi nemaye ,em dê bine mirîşik û hêka kin!! Bikenî ve hevalekî dî gut:

- nuke ew kabirayê em hêka jê dikerin,na bêjit eve çi livan hemû hêka dikin??!! ew kur axayê xwarinê dirust diket gut:

- na wela, nuke mirîşik dibêjin,eve kîne van hêka dixun? Nê em bihêk kirinê ve mirin!! Kes nema jidil ne kenî.

Cêgirê rêberî,belên da cara bêt xwarneka xuş û baş bînin!!

Piştî xwarnê û vexwarnê,dîsan zifirîn ser suhbet ûyaryên xwe .gelek cara xwe jibîr dikirin û nedizanîn ka likîvene? Ka çi diken?Jiber yariyeka xuş.yan demê hevalekî suhbetek yan serhatiyeka xwe yan ya hevalekî fikir. gelek cara hemû lidurên hevalekî kum dibun û bu wan pêkenîn digutin.lê dibaye keniya wan jiwê pencera beramberî rêya giştî dernekevt.

çend hevalek jiwî kevlujankî derketba,sê çarek lê dixurîn û bîra wî dîna,ew kenî û xuşî didilî da dihêla.

Dema pêjina mirova yan zenga telefonê yan livîna bay dihat,hemû dibune qurmik û bédeng û giyan diman.

her wekû mirovên wî bajêrî hemû liwan digerin!!

Careka dî bîrhatinên "enfala" liwan nû dikirin!!

Wî Mamustayê rwşenbîr,şiya gelek cara hemûya lidur xwe kum bikit,û dinav baxçê hizirubîrên rwşenbîrî,yan digêleşukeka ramiyarî,yan dinav muzexaneka mêjûya kurdî da berze biket.car jî binê pêt hizirên wan dixurand û pirsiyarên asê û giring jiwan dikirin,da zanîna wan her geş bimînit,her şev berperek jipertuka hizirên xwe bu wan dixwand û şiruve dikir.da rojên wan digel şeva bisanahî biburin....

her sipêdê zû bibu ger û dur liser serşwyê û cihê xwe gihorinê .

Dîsan hemûya xwe amade dikirin jibu çunê,ku ev şeve libere .

hind yên serurîha ditiraşin,hind yên cilkên xwe amade diken,hizira hindekên dî yên birîne binê bîreka kûr...

eve şev biserda hat, her jivanê wan yê nêzîk dibit,her bê dengî ya serê wan dixut!!

Liser wê livîna zêde û wê amadekirina berdewam,bê dengyê şiyaye liser wan zal bibit.

Çik çika dem hijmêra biwî dîwarîve,guha disimt,her wekû çi giyandar divî xanîve nînin !

Dengê dilê wan zal bu liser dengê wê dem hijmêra lipêş çavên gelek jiwan,wek sêdarê diyar dikir.

ha ha dê "dêw" ête jor û dê wek hercar bêjit:

- biburin, evro jî rê ya nexuşe,em neşên xwe liçi agira bidin.

Dê ew nîva dî ya jijiyê wan yê may sujit.

Digel çirka êkê jijivanî,pitir jinîva wan,wek tîpeka hunerî û êk livîn,berê xwe dane dem hijmêrên destê xwe û ewa lihindav serê wan,û pêkive gutin:

-eve ne hat ??

ew çend çirkeyên piştî jivanî,gelek digiran bun.gelek cara hizira  
jituxîbê wê jorê dibirine derê.girtin,zfirîn, derbaz bun. jiyaneke nû.  
hindek cara pila hizira digehşte kuşt^ bidestê mafiya...

Lê dengê dergehî hemû jiwê xaf bunê înan ser rastiyeke dijwar.

Vê carê bidevekî kenîve hate jor .vê carê ne ew "dêwê" carane!vê  
carê wek"fi^ta"fi^tên bihehştê,mizgîniya çunê û rêyeke xuş da  
wan!

Lê kesê neşya desta bu biqutit,yan jidil bikite hewar û keyf.

Carekadî rengê dêwa girt,demê hindek ji wan ji kevlujankê xwe  
derketin û dengê wan çend bihusteka ji lêvên wan dûr ketî û gut:

- dût dût, her car kes bibine heval û berev turimbêlên amade.çi  
axivtin û çi livîn nabin,heker dê em hemû tuş bin,û vê carê dê gelek  
kirêt tuş bin!!

Dîsan bu berîkanê û her kesek bu xwe sê hevala bigirt da pêkve biçin  
...

hindek ji car kesa pitirin û nevên êktir bihêlin,hindek bitinê ne,kes  
digel xwe nabit.û gelek astengên dî...!!

Cara dî jiber hindek xeletiya,ketin destên polîsa û rêya wan diyar  
bu,û zifirandin nav

bajêri,pişti jihevaleki pirsî û gutê:

- ka paspurta te??

Wî jî ji hemû dilê xwe gutê:

- paspurta min ya livêre ...anku ya linik hevalên me .

ew polîs wesa tê gheşt,paspurta wî ya li "evêrî" anku bizimanê rusî,daêra paspurta .gute hemûya keremkin herine cihên hûn jê hatîn!!

Biher seruberî vê carê hemûya xwe gehande wan turimbêla û jiwê girtîxanê rizgar bun,û kes liwê hîvyê nebu carekadî bizifirtê.

Turimbêl beref berzebunê çun,dîsan tirsê û bê baweryê leşê wan xwarin.

Piştî demekî dirêj liaqarekî înanê xwar.wek leşkerekê xwe bu hêrşekê amade dikit,liser çuka û zkî xwe gehandine coyeka bê av,dinav giyayekî buş da,xwe digel erdî rast kirin,bê dengyê û bê livînê wek peykera diyar dikirin.

Rêberê wan wek diza çu,kesê nezanî ka dê çi kit?

Piştî demekî dirêj digel serê tirênê zifirî,jituxîbê siluvak hate dinav axa ukiraiyna da..!liwî aqarê bê xudan.hemû dinav wan amîretên wê da veşartin û carekadî beref kuntirula siluvak zifirîn!!

Destên wan bidilên wan ve bun,her livînek,her dengêk, dê wan tê bit,û dibit dinav

amîrên tirênê da bêne hêran.

Tirs zêde bu,bê dengî zêde bu,tirsa bivî rengî wan gelek dîtîe!!

Jiyana wan hemû tirse,firçkê xwe bitirsê kirîne,gelek ji wan jitirsa jidayk buyne !

Lê wesa diyar bu,hemûya ageh ji êk hebun!Bisanahî ji her dû kuntirula derbaz bun,ne gelek ji wî cihî dûr, berdane nav wî aqarî .

Turimbêleka nîv lurî lihîviya wan bu.wek gunyên kayê heşandine diwê turimbêlê da û beref qunaxeka dî. turimbêlek liberahya wan û êk bidûv ra.bitelefunê kuntirula rê dikirin,her tiştêk biguman

diyar dibu, bitelefunê agadariya êk dikirin,xwe ji rê didane paş.  
wesa çend dem hijmêreka kêşa,heta gehştîne bajêrê kuşysa.

Şureşa îlunê,şureşa gulanê,enfal û derbederî,sutina gunda û  
kuştina tevaiy,serhildan,reva melyonî ...

Wek kasêteka sînemayê lipêş çavên wan dûbare dibu....

Gelek jiwan biçavên xwe dîmenên girêt dîtîne!!

Gelek jiwan digirtîxanên dujmnada rizîne !!

Muyên ^ê wan zil dibun.dema ew roj dihatin bîra wan!!

Lê nihu ew roj neman û her yên direvin jitirsa wan roja! neku  
dubare bibin!!!

Liberê sipêdê,luriya wan gehşte bajêrê kuşysa lisiluvak.

Ji wê tengaviya ew têda rizgar bun.ptir ji sîh û dû kesa diwê  
turimbêla biçûk da . Jihemû rengên mirova,jin,biçûk,pîr,tulaz....

Jibêhin tengyê,kes neşya bêhina xwe bihi^şt,gerim û birs û tirs û  
cihê teng,bune êk û beramberî hîviya wan ji bu paşerojeka baş û  
tena.

Licihekî taybet,turimbêla wan rawestiya,lê demekî dirêj têda  
hêlan,lihîviya telefuna rêberê qunaxa bêt.

Diwî demî da pitir tengav bun,jiber germê û bêhin tengyê û  
destava!!

Piştî demekî ku hemû xav bibun,jibirs û bêhin tengyê, dûdû sê sê  
birine derê û dane digel rêberekî û beref nav bajêrî birin .

her wekû hêzeka pêşmerga,li gundekî dibun mêvan,her çend kesek  
dibirine malekê.

her wekû xelkê wî bajêrî jî dizanit ka ew kîne?Ka çi hatîe serê wan?Ka liçi digerin?

Bi dilekî firhe,hemû xudan kirin.her çende beramberî hindek dulara.lê wan dulara divî deravî da çi biha nebu.

Tinê wan diviyan bixun,binivin,tena bin!!

Xwarneka xuş,bêhinvedaneka baş,serşûştin û nivistin licihekî tena. lê eve ne qunaxa wan ya dawyê ye.

Piştî jibêhinvedanê û xwarnê û nivistinê têr bwîn. telefuna kêiyf kirin,da hevalên wan bizanin ka diçi destudar dane.

Piştî gelek telefon kirîn û kesê bersif neday.

telefuna hindek hevalên dî kirin,zanîn ku mafiya ew hevalê şeva êkê limala wî bwîne mêvan digel jinka wî bikêra kuştîne û parên wan birîne!!

eve ewjî bune qurbanî vê rê .eve ewjî bune qurbanî hindek dulara.kesê neşya harîkariya wan biket,û jivî deravî rizgar bikit.

Bûk û zavatiya xwe lixerîbiya burandin.berî bibine dayk û bab,gurî welatekî nedîtî bun!!

Jiwelatekê sava,beref welatekê sar cun !!

Kêmtir jihizar dulara mabun.ew jî da digel vî karwanî derbaz bin!!

Lê kesê destê wan negirt !! Kesê giyanê wan ne kirî !!

Nihu dê carekadî şahya wan bu dayka wan zifirit welatî, nihu dê carekadî bine bûk û zava !!

Dilê hemûya gelek ma !! ew xuşya têda bu nexuşî !! Tirsa wan zêde bu !!

Birs û hejarî,dujminê mirovayetyê ye !! Welatekî birsî û bê kar.mirovên diz û mirov kuja peyda dikit !! eve jî her guneha desthelatdaraye !!

Wek rêya "kadiza",şupa vî karwanî,her jidest pêkê,heta binecihê,xwyaye.. hemû kêlî û şûnwaû gurin!! hemû bîrhatinên reşin....!!

Dîsan tirs,xweveşartin,dinav destên rêberên bê dil,û hîviya wan,dan berêk.

Karwanê wan kirine çend cûn û cuda litirênê siwar kirin, piştî bu wan pilêt birîn,û demek bu hatene xwara wan diyar kirîn,jibu qunaxa bêt,"burdislava"paytextê siluvak!

Dişeveka direng ra gehştine cihê diyar kirî liburdslava..

hevalên wan,ewên berî hatîn hêştta yên liwara.lihîviya rêberê qunaxa bêt.kes diyar nîne,polîs jimirova pitirin. lê wesa diyare,ew jî dizanin eve ne qunaxa wan ya dawyê ye!! Mêvanên demekî kurtin,lewra çi pirsiyar û dûf çunê likesê nakin .

hemû man diwê zifirukê da heta rêber diyar buy .

ne êk rêber,liser bu şere rêbera,û her kesê digut ez dê wan derbaz kim .

Dîsan kirin gelek cûn û bir û hindek her wê gavê dane rê û ewên mayn,birin danane utêleka gelek xuş û berfirhe gut:

-ez dê hewe keme dû cûn .cûnekê dê subehî sipêdê bem,û cûna dî bu dûsibe hêlm.divêt cûna subehe xwe amade bikit û parên wan dihazir bin.

Bi şev lêk kum bun,ka dê kî subhe çit? Ê ka dê çewa bawerî hebit?Ka dê çewa para dine rêberekî ne niyas??



Lê pişti rêber hati û guti:

- divêt hûn ev şeve para bidene min,da subhe bu hewe turimbêla amade bikim .

Ketin beramber rastîekê û divêt jê ne revin !!

Pare dan,yan didestê rêber û polîsa da?!Rêber û polîs hevalin û her ^tê wan bivêt,dê kin û çî jikesê naêt !!

Cîna sube necar bun û parên xwe dane destê rêberekê neniya û xwe amade kirin jibu qunaxa bêt û çuna pirag.

-heker ew birin?!eve em jî cun.

-heker ew nebirin û parên wan hatin xwarin??!eve em jiwê çendê rizgar bun!!

Şeveka direng nivistin,nivistineka giran.

leşekê westiyay,dil û mejyên peşêman û tijî tirs,û paşerojeka nediya.

Wê şevê kes nema dixewa xweda hizar cara ne mirî,û ne hatiye kuştin,yan girtin!

Kes nema jibilindahya çiya nefirî!! Kes nema liber sîngê dayka xwe ,dixewda negirî...

Sipêdê wek diza ewên mayn bu roja duwê,çun ber dergehên hevalên xwe,ka çwîne yan ne?!

Piştî lêk kum buyn,zanîn hevalên wan yên çuyn.

dilên wan tena bun û bawer kirin,ew jî dê subehî dine rê.dê subehî hîviya wan çend bihusteka nêzîk bit.ew qunaxa diçinê dê nêzîk bit,dilê hemûya geş bu rengê mirova girtin.roja wan bixuşî û suhbeta ve burî,bişev carekadî rêber hat û pare jiewên mayn wergirtin,da sube sipêdê zû ew jî biçin!!

Wê şevê hemûya xwe amade kirin jibu çuna sube.

dîsan hizar xewin û hizir bune mêvanên dilê wan,heta lê buye sipêde .

Sipêdê û lidemê diyarkirî,hemû licihê diyarkirî amade bun,piştî nasnamên xwe jiutêlê wergirtîn,simkuy gut:

-eve tişteki shîre?!Vê utêlê daxwaza çinasnama jime nekirin?Razî bun binasnamên me?

hevaleki gut:

- çi jê ne dizanîn,û gelek jime her çi nasname nebun!!

Sê turimbêlên biçûk,her êk car kes têda û beref pirag.

ev welate wek baxçeki gelek ciwane,her wekû dû dildara bu xuşya xwe dirust kirîn.... Gelek cara wan digut,Kurdistan paytextê cîhanê ye. Kurdistan mêrgeha evîndaraye. Çi çih jiKurdistanê xuştir nînin!! Şînkati,darubar,çiya,rûbar,mêrg,gund....

Wesa diyare her kes welatê xwe nadite biwelatên xelki. herkesê welatê wî linik dilê wî jicîhanê hemûyê xuştire!!

Taybet ewên hêştaya xuşiya çi welata ne dîtîn^ştaya liçi welata bitenahî ne nivistîn^ştaya ne buyne xudan welateki serbixwe,hêştaya tama wê xuşyê û wê serbilindiyê û wê azadiyê ne dîtine.û hêştaya linik wan wek xewneka mezine.û hîviyeka dûre!!

ev welate hemû daristan û çandine,rê û rêbar û seruberê jiyane,her hinde. Çavên wan jipencera turimbêlê ve nabun.nezanîn ka çewa demê wan burî ?

Linav bajêrkekê biçûk liser tuxîbê siluvak û çik înane xwar û gute wan:

- divêt likuntirulê serekî derbaz nebin,jiber kuntirul gelek diware û pirsîyar û lê geriyan hene.jiber vê çendê,em dê hewe birêya tirênê derbaz kin rexê dî !

ew bajêrkê biçûk,hatiye dabeş kirin dinavbera her dû dewleta da,nêveka wan siluvakin û nîv çîkin.

Jiyana wan berdewame ,hatin û çuna wan bisanahîye ,ew tirên dinavbera wan da kar diket,her wekû hemû kurên dayk û babekî .

Bu wan pilêt kirîn û bidemekî gelek kê,m,gehştin rexê dî. turimbêlên wan lihîviya wan bun !!

eve kumara çîke!! Ciwaniya wê,û rêk rêbarên wê,gelek ji siluvak xuştir û pêfketî tir bun!!

Dîsan gund û bajêr tijî çavên xwe kirin,heta gheştin bajêrê"bimu"bajêrê birnu,ciwanyeka taybet û lêkday û rêkupêk,ew xewna gelek jiwan ya berî çend sala,new biçih hat!!

Geleka Mirad bu,bajêrê birnu bibînin,jiber gelek egera, êk jiwan egera,tivenga birnu bu.

Gelek dişoreşa da dihate bikar înan,kes nebu birnuyek limala xwe ney. digotin livî bajêrî dirust dîkin !!

Lê nihu lichê birnuyê û lidergehê sereki yê bajêrê birnu. wênê sêveka mezin

nexşadiye.eve jî ramana jiyane û paşerojê ye....!

her çende sistema berê ya çîkusluvak,gelek harîkariya dujminên wan kirê û kes jimilletê wan nemaye parçeka asne çîkusluvakî ^ê wî ne simtî bit!!

Yan qutan û lêdan jidestê wan sîxwera ne dîtbit,ewên liqutabxanên çîkusluvak hatîne fêrkin û dilekê reş û req bu çandî.

Li ser wê çendê, nihu cîhan hatiye guhurîn û gel û mllet beref pêşve cunê diçin û gelek serbixwe wazad buyne.

Berê wan her ma libajêrê birnu, turimbêla wan jê burî. geleka jivan diviyan çendekê lê bimînin, lê ne demê hindê bu.

Lidemekî bajêr nema, lipişt wan darubara berze bu .

her gundek yan bajêrek dirêya wan da jiyê dî ciwantire, bêhna wan firhe bu û jiwê tirs û westiyanê dûr ketin, û bawer kirin dê jiyana wan ya bêt xuştir bit!!

Sipêdê zû dabune rê, û nihu beref êvare, gehştin pirag ku beşeke jibiheştê !!

Lirexê westgehê danan û gute wan:

-eve pirage ..û ewahe westgehe, û karême û erkê me heta vêrêye, û jivêrê û pêve êkê dî dê hewe bit.

-eve ye pirag?! eveye hêliyna sîxur û parastina rijêma?! eve ye mêrgeha qamçîvana û mêrkojên diktatura?!

û lirexê dî, bibu warê siyaset medarên dûr welat!!

Bibu kuçka penaber û rikeberan. eve welatekî shîre?!

Gelek man lihîviya rêberê qunaxa bêt, lê limal nebu. çune westgehê û carekadî jivan û bê hîviyê hêr kirin.

her çendekê telefon bu rêberî dikirin, digut dê piştî demekî dî êt.

Xelkê rojhelat, livan welata karê wan qaçaxî û karên ne dirêda ne !!

Dîsan tirs û birs û westiyan, xwe dinaf dilê wan da akincî kirin.

Lê ciwani û seruberê pirag, û kiçên we, û destudarê bajêri hemu tişt jibira wan birin!! her wekû licîhaneka dî. ne ew cîhana têda mezin buyn.

Kesê ageh jîwan nîne ,her kes dirêya xwe û liser şu^ xwe.ne pirse û ne polîs.

heta rêberê wan hatî û liturimbêla xwe siwarkirîn û birine kempeka shîranghea birex bajêrê pirag ve. cihekê gelek xuş û tena xanyên darê ve.gelek kesên dî jî diwan kerevana da bun,lê hemû shîran gerên biyanî bu!!

ev seyrangehe kujîekê biheştê ye .mêvanên wê jîhemû curane.diniya her ewe,ewa ew têda.jiyan ew deme,ewê ew dijîn!!Çi ageh jiarâşa diniyayê U kêşan U pîvana siyasetmedara nîne !!

Piştî xwarin û bêhin vedanê,zanîn ku hevalên wan hemû bisilametî gehştin pirag.

her çendek licihekî kum kirin,lihîviya qunaxa dawiyê !!

Qunaxa dawiyê.çi nemaye dê gehnê.çi nemaye dê wê Miradê bicihînin.

Tijî difinên wan bêhna wê qunaxa eve çend sale pêkulê bu diken bû.bêhna elmaniya,mejyê wan har kir.

çend bihustin,dê tewaf kene wê mala xudê

Bêhnvedaneka dirêj,carekadî karkirin jibu qunaxa dawiyê...

Şevêkê man diwan kerevana da,heta rêbera karê xwe kirîn û dîsan kirin dû çîn û diêvareka direng ra beref tuxîbê elmaniya birin.

Liser tuxîbî dinav daristanê da veşartin,heta hevalên wan hemû kum kirîn.

Sê kes,êk lipiştê U êk linîvê U êk lidawiyê.dane digel û dinîva wê daristana tarî ra birin.

Tirs û birs û sermayê zifirandin rojên reva melyonî ya milletê wan.demê berev tuxîbên dewrubera revîn,jitirsa qir kirina tevayî....!

Dîsan ew rûdan dihatin pêş çavên wan,dilê wan diqurmçî,pirsiyar dikirin,erê heta kengî rev û veşartin û tirs dê bite karê wan??!!

erê ew welatê ew jê hatîn,xuştire,yan evê nihu diçinê?! û hizar erê yê dî???

Wek rojên şerî,dema efser,serbazên xwe her çend pêngaveka dihmêrt û kuntrul dikin!

her çend pêngaveka,dihjmartin û rêya xwe kuntirul dikirin,her wekû hindêk nîşan hebun,hindeka bu wan rê dirust dikir.vê çendê nêzîkî dem hijmêrekê kêşa .

Dinav wê daristana gelek asê û tarî,gelek rengên giyanewera hebun,gelek westiyan û nexuşi,jin û biçûk, pîr û nesax.bizurî rêya xwe didîtin,gelek jigiyane xwe bêhîvî bun!!

Liber lêva cadê,gute wan xwe nizim biken û bê deng bimînin!!

Piştî demekî kurt,dengê rawestiyana hindêk turimbêla hat!!

Fîtik bu êk vedan,rê pişt rast kirin.eve êk jinîşanên wan bun.

kirin çar çare,û her çar diturimbêlekê da,Êkser wek bayê birusiyê dane rê û dinav axa elmaniya da berze kirin !!

eveye,ew elmaniya hinde xewin pê didîtin?!eveye,ew welatê gelek xebat jibu dîtina wê kirîn û welatê xwe gurî kirîn??!!eve dê bite welatê wan? Piştî hizareha şhhîd û qurbanî,gund û şureş gurî xwe kirîn??!!eve dê bite welatê wan?Piştî welatek bixwînê ava kirîn??!!

eveye welatê hizira didizit û leşa dikirt?eve ye,ew welatê her kesê bêhin kire axa wê,neşêt jê dûr kevit? eveye welatê zanist û

yasayê?eveye welatê mirov lê dibit amîr û berze dibit?eveye ,ew  
welatê biyaniya bipirça wan û renigê çavên wan  
diniyast?eveye,welatê pare û şul û mirovayetî diêk terazyê da diên  
kêşan û pîvan?eveye biheşta penaberên bê xudan??!!

Dîsan tirs û westiyan û paşeroja berze,hemo mendehoş kirin.

Raste,axa wê "hêrûyne" tiriyaqe"mirovî hêr dikit,mirov xwe jibîr  
dikit!!

Piştî çend dem hijmêra,libajêrkekî înan xwar û gutin:

-em û hûn jêk xilas .

Dîsan şepirze bun û rê lê berze bun.êk jiwan şufêra harî wan kir û  
bu wan hindêk taksî girtin heta berlîn,her car kes ditaksiyekê da û  
beref berlîn.

Berlîn,ev navê hinde mezin û giran.her êk jiwan diserê xwe da bi  
rengêkî didît!

Dîsan dê Mirada hindêka bicih êt,ku dîtina berlîn bu.

lê hêşta ditirsin,piştî berlîn dê kîve çin?! Dê çi ête rêya wan?!

Gelek hizir û pirsiyar diserê wan da bun!!Peşêmanyê hêşta dilê  
hindêka azad nekiryê!

-eve em gehştin^ çewa biçûkên me gehin?!em dê çewa biçûkên  
xwe bivan rêya înin?!ew dê çewa şên divan rê û rêbara derbaz  
bin?!her diha êk bisilametî digehit!!

ev hizire hemû belav bun,demê wî kur tulazê turimbêl dihajut gutî:

-eve berlîne !ez hewe jivêrê û wêve nabim !

Livalayekî danan û gut:

-hûn dişên her cihê hewe bivêt bimîtiroya bin erdî biçinê .

Kes jîwan çî jimîtiroya nîzanî, eve cara êkê ye dibînî! Ka dê bu kîj cihî çî? Û dê çewa siwar bin?

Têkhatin û cun, hemû rê liber berze bun, wek pezê bê şivan, liwara belav bun û her çend kesek bu xwe çun!

Simku û hevalên xwe, taksîek girtin û bihindek axivtinên iniglîzî gutê, me bigehyne westgehê.

Wê jîna taksî dihajut gut:

- liberlîn car westgeh hene ! hewe kîj divêt?!
- ya serekî û jîhemîyan mezintir!!

Carekadî, tirsekadî û hîzar duwa, hemû qurbanî silametiye bin, silameti bîniyatê her tiştê ye!!

Piştî demekî kê, liber dergehê westgehê serekî ye berlîn danan .

Simku gut:

- em çî biken? Kîve biçin? Divêt em xwe ne dine nav hevala!!

her hevalên wan yên kum dibin liwara, eve bu cihê tirsê ku polîs gumanê bibin .

Simku û her dû hevalên xwe ku jîbinechê pêkve hatbun, xwe jîhevala cuda kirin û dûr jîwestgehê û liber dîwarekî nivistin.

dem berê sipêdê ye, çî sûk nînin, neşên telefona kesê divî demî da bikin.

Liber wî diwarê çend bihusteka bilind, û jîpîsatî u gileşî u mîza sa u serxuşa. rengê xwe berze kirî, hersê nivistin!!

Lê ma dê çewa xew êt?!

Serma, tirs, bîrs, paşeroja berze, westîyan!



Diwan çend dem hijmêrada, simku gelek cara dinav devê gurgada dihat hêran, gelek cara dinav agirî da disut, car jî seyên polîsa dixwar. lê keyfa wî gelek dihat, demê liser

piştê bidûv turimbêleka leşkerî dihate kêşan û liber derê mala babê wî dirawestiya, pê nê vedikirin û digute dayka wî:

-eve kurê te, me jiezaba xerîbyê rizgar kir û bute îna!

Gelek keyfa wî dihat, her çende gelek teniftên wî û piştê wî diêşan, berî birînên xwe nîşa dayka xwe bidit, dengê kenîya çend serxuşeka jiwê xewin û xewa giran hişyar kire nav rastîeka girantir....

Bilez û tirs hevalên xwe hişyar kirin, û xwe jiwestgehê dûr kirin, hevalên wan hêştê yê liwara û polîs jimirova pitirin, her kesê bête girtin, dê paşeroja wî nediyar bit.

Şêrkuy gut:

-heker berlîn ya husa pîs û kivil bit? Pa dê bajêrên dî di çewa bin?!

Simkuy gut:

-eve ne demê gazindaye! Divêt em qesta cihê telefuna bikin.

ew telefon hemû dişkestî û bê kar bun, piştê gelek jiwana cerbandîn. cune postê û gelek cara jimara wî hevalê ku eve demêke liberlînê lêdan, kesê bersif ne dida.

Simku gut:

- dibit em şaş lê didin? Da pirsiyara vî kabirayê he biken, ewê lipositî kar dikit .

Wî gelek bisanahî wergirt û şiyar digel hevalê xwe bi axivin, gutê:

- bizûtirîn dem were pêşya me, û me jivê tengaviyê rizgar bike.

Wî jî bidilekî berfireh û merdane piştî demekî kurt hat û xwe havête wan û gut:

- lidûv min werin,bila kes nizanit ku em yên pêkve!

Wan jî xwe da digel û dimîtiroyê siwar bun û çune rexê dî yê berlîn,li cihekî berfireh û jitirsa polîsa dûr,Carekadî hate serê wan û pirsiyara halê wan kir û gut:

-ez bawerim hûn gelek dibirisîne??

Kesê jîwan bawer ne dikir ku dê êk pirsiyareka bivî rengî ji wan kit.hersê ya pêkve gutin:

-erê bawer bike,me rengê nanî yê jibîr kirî! !

- dê keremken,eve xwaringehêka xuşe,û ka hewe çi divêt teksîr nekin!!

Liberî wan ket û birine xwaringehêka rojhelatiya, xwarineka gelek xuş û bitam dayê û bidûvra çayeka gerim jî biserda kirin.

Westiyana wan verevî,tirsa wan berze bû,hîvî nêzîk bun.diwan çirkeyên xuşyê da gute wan:

-hûn dizanin ku hevalê hewe yê dî nihu limala meye û li hîviya heweye?!

ev gutine bu wan gelek xuş û dil veker bun.pştî jiber nexuşiya rê û fermanên rêbera,hevalê xwe hêlayn,yan wî ew hêlan,eve carekadî jî gehştin êk.

- nihu hewe çi libere ?hûn dê çi kin?Dê kîve çin?

Simku. bersiva wî da:

- birastî,berî em çi pêngava pavên,me divêt em biçine mala birayê min,û ew dê pitir bu me rê xuş kit,dibit wî pitir pêzanîn liser penaberyê hebin?!

- raste ,eve biriyara hewe hemiya ne?

- belê..

-erê..

Şêrkuy jisherdu hevalên xwe pitir ew birader diniyasê û gutê:

- lê,bibure,me pare nemayne,divêt tu bu me bilêta heta "miywnix" bibirî,û em dê bute bizûtirîn dem hinêrin.

- bira xwe tengav nekin,ez amademe,û çî cara behsê zifirandina wan para nekin. Simku gut:

- nexêr qed nabît .divêt her bute bizifirînin û bizûtirîn dem.

Şêrkuy jî gut:

- divêt em çî car qenciya te jibîr nekin, tu jî dest tengî, divêt carekadî wan para bute bihinêrin.

- bawer biken,dilê min pê xuşe,ez her xizmeta hewe bikem,û biburin,min jidil diviya hewe limala xwe çend rojeka mêvan bikem,lê me êk jor ya hey,bu min û jinka min û digel biçûkekî .vêca limin biburin!

hevalê wan yê dî gut:

-hevalê delal,te çî liser xwe ne hêla û eva te kirî bu me gelek dîna.

Jiberlîn heta miywnix,pitir jihevî dem ejmêrane,divêt dû tirêna bigihurin.

Piştî hevalê wan yê dî jî gehştiye wan,her car beramberî êk rûniştin cihekî xuş.

eve cara êkêye ditirêneka wesa nû û pêşketî siwar dibin. çavên wan jipencera ve nebun,gund û bajêrkên ciwan û daristanên xemlandî.pîsatiya berlîn jibîr kirin.

eve cîhaneka cudaye,jiwê cîhana ew jê hatîn.

mirovên wê,ne wek mirovên wane!

Kiç ne ew kiçe!Jin,biçûk.her wekû xewin.zmanekî giran.destudarekê cuda...!

Diêvareka zû gehştin miywnix,ew miwnixa hinda binav û deng,ewa hind linik wan dûr û dîtina wê bibu Mirad. "bayêrmiywmx"baştmn yana tupana pêy,nihu mêvanên wê ne.

Birayê simku lihîviya wan bu.wek diza dane bidûv xwe û gut:

- werin û xwe bimin ne înine der !

Polîs tijî hemû rexa nin!

Kesê ageh ji kesê nîne,piştî demekî jiçavên polîsa dûr ketîn,bigermî xwe havête hemiya û êk êk hembêz kirin. pirsiyara halê wan kirin.

eve çend salin êktir ne dîtîne ,ew biduniyayê ket,şureş û derbederî, nihu xerîbî.

eve ew jî gehşte cîhana wî,nihu dayika wan diçi hizir daye?

limala wî ya xuş û tena.her car rûniştin,xwarineka gelek xûş û suhbet, axivtin,serşûştin û xwe ji dil tena kirin...

Birayê wî gut:

-hûn carekadî gelek bixêr hatin!!

- supas, gelek memnun.

-hûn gelek westiyan?heta hûn hatîn?!

-erê bawer bike ,em nêziki mmnê bun.

- rê û rêbar gelek dinexuşin,û liser hindê ra,her xelikek yê diêt!  
!

- bê hîvîyê xelik kuşt ! Çi nemaye mirov lihîviya wî bimînit!!

-erê rewşa welatî diçi qunax daye ?

- welatê çi?!Halê çi?! her kes û mêranî û bextê xwe ye ! Te çend mirov hene, teçend pare heye!Tu hindê diînî?!

-ez bawerim husa Namînit!Dê her biserekî kevit,bila em vê çendê baş bizanin û rojên reş jibîr nekin!!

- lê dê gelek ser tê çin!

Piştî jiwan tiştê têr buyn,ewên eve demeke nexwarîn û vexwarîn, axivtin hate ser suhbeta penaberyê û wergirtina wê.kadê çewa bit?Û ka dê çi pirsiyara jiwan kin?

Birayê simku gelek bersiv bu pirsiyarên wan hebun,her êk jiwan bu pirugramek amadekir û rêyek bu dana lidûv belge û zanîn û amade bunawî !!

Wê şevê heta direng mane hişiyar,simku her ne nivîst, jihizir û keyfa da .

Demê çavên wî diketin ser êk,di çû nav xewneka gelek kirêt da,car jî liber perên esmana difirî û car jî diket desitîn mirov xwera û car jî avada dixendqî....

Lewra xewa wi wek ya zêrevanê miri lê hatbu....

Sipêdê dîsan lêk kum bun liser xwarinê.suhbetê birine ser,ka dê çewa karê xwe kin jibu qunaxa dawiyê,ewjî çuna kempê ye?Kadê likîve bit?Û ka çi çih zûtir penabera werdigirt?

Piştî birayê simkuy gelek telefon û pirsiyar kirîn,biriyara wan kete ser kempa "kalisruhê"her car diturimbêla xwe siwar kirin û beref "kalisruhê"limala hevalekî

wî,diêvarî ra bune mêvan.

Sê mêvanên dî jî wan hebun,ewjî wek wan jinû hatbun. eve bune hevit kes û êk armanc.

Xudanê malê gut:

-hûn hemû gelek bixêr hatin,eve hewejî Kurdistan hêla?

- nexêr,me Kurdistan ne hêlaye,Kurdistan her ya didilê me da lê ez dibînim eve jî regekî ŞureŞê ye !!

- şureş ?!! Şureş berxwedane ..ne reve jidurhêlê !!

- revîn jifkestinê baştîre,û jihevrikiya bê hîvî jî serketî tire....

- bidîtina min,man baştir bu jihemû rengên dî.

- mirov jibu hîviya xebatê diket,heker hîvî neman,mirov jî Namînt!!

- cîcar hîvî namirin !heker mirov kar bikî,dê hemû astenga ji rêya xwe rakî!!

Carekadî dibêjim revîn ne çareye!!

hindeka diviya jivî babetî dûr bikevin,da serê wan yê tena lê ne bite êş.axiftin û suhbet birine ser penaberyê û pirsiyara,ka dê bi çi reng bin?

her kesê wek dîtin û têgehştina wî rê bu danan.

ewên berê livî welatî,gelek tişt bu wan run kirin û gelek bersif bu pirsiyarên wan hebun.

Wê şevê qutana dilê wan jigelek şeva zêdetir bu.tirsa wan jipaşeroja nediyar hêştî ya xurt bu.pefêmanî her digel wan mabu !!

Şeva kurt hemû jiwan xewnên dirinde rizgar kirin, sipêdê pêkive rabun karê xwe kirin,lê hevala gutin:

-hûn hevit kesin,xwe bikene dû cîn,da hûn nebne gelek,û em bişên hewe biturimbêlekê bibine kempê, û jiber tirsan polîsan.

Sê hevala xwe amadekirin û digel xudanê malê cun beref kempê û car man bu cara dûyê .

Piştî nîviro simku û şêrku û her dû hevalên wan liber derê kempê dana û gute wan: -eve kempe ,herine jor.

her êk jiwan diserê xwe da kemp birengêkî didît,hinda wesa hizir dikirin,ku eve ewrupa ye,û divêt kempên wan lidûv pêşketina wan bin!

Dihizira hindeka da,avahiyekê mezin û paqij û hemû curên xizmetê têda hene .hinda digut tu bêjî wek çadirgehên silupî û muşê bin?Lê dîsan dizifirîn û di gutin, nexêr .ewrupî wek turka nînin .kempên wan jî wek yên turka nabin !!

Simku neşya xwe pitir bigirt û gut:

-eve kempe?!

hevalekê wan gut:

-erê, wesa diyare...

Şêrkuy serê xwe hejand û gut:

- bawer bikin,em dê tif kine wê roja em hatîne vî welatî. hevalekê dî gut:

-eve kempe, yan girtîxaneyê?!

Simkuy gut:

- xwe tengav neken,me hevit tuxîb yên birîn,heta em gheştîn,hewe divêt bêne berhiya me??

Bune rêz û liberamberî wê pencera liber dergehê kempê,serê polîsekî diyar fikir.

Bi ezmanê xwe,û bipîçeka iniglîzyê şyan xwe bidene niyasîn .

Bu wî polîsî bibu ^tekê rojane,nasnamên wan jê wergirtin,kaxezek da destê wan û digel kabirayekê dî hinartine jora tişt wergirtinê,her êk jiwan beteniyek û çarçevêk,û destmalek danê,û birine joreka mezin û gute wan:

-eve cihê hewe ye!

her êk jiwan cihek bu xwe diyar kir û liser rûnişt û ^tên xwe kirine diqensura xwe da,û pitir binecih bun û dilê wan tena bu.Piştî jilêkdana wan tişt xilas buyn,berê xwe dan nav çavên êk,regê serketinê xûya fikir,eve gehştin qunaxa dawiyê!eve Mirad û hîviya wan bicih hat !!

erê piştî vê çendê?erê ma eve dawiyê?Dê çewa bersiva xwe din?Dê çewa biçûkên xwe înin?ev welate dê heta kengî bite welatê wan?

ev hemû pirsiyar û hizire bidawî hatin,demê tulazekî dergeh vekirî û her wî kabirayê

ew inayne jor,ewji ina wî cihê vala liwê jora ew lê.

her zû bêihna wan teng bu û diviyan bizanin ka hevalên wan çi lê hatin?Û ka dinav vê kempê çi heye?

Pêkive cun derê û linav kempê geriyan,gelek kesên niyas dîtin û hevalên wan jî liwara bun.

kempeka tijî mirov û rojane zêde dibin.mirov hest dikit kes nema liwelatî,welat vala bû !!



Bişev dijora xweda,digel hindek hevala,ku berî wan liwê kempê bun,dirûniştîne,suhbeta germe ,hîvî ya nêzîke ,her kes yê behsê hatina xwe û rêya xwe dikit.

hindek eve pitir jisê sala birêve ,hindek eve deh cara xwe livan rêya dan û derbaz nebun,jiblî ewên diavada berzebuyn,yan ewên bidestê cendirme û mîtê hatîne kuştin,yan biser mîna daketîn,zêdebarî ewên parên wan bidestê rêber û fêlbaza da cuyn.nimune gelek.

Êkî rêya axivtinê vekir:

- min xanyê xwe û zêrên jinka xwe û turimbêla xwe û her ^tekê min hey,firutin û destê biçûkên xwe girt û ez hatim,lê her liqunaxa êkê liturkiya,ez ketim tura rêberêkê bê dil û heta bihayê xwarinê me ne ma.gelek şeva em liser cadê û birsî dinivistin,heta em pêkive zifirandin pişt tuxîbî.lê carekadî ez bitinê hatim û min biçûkên xwe hêlan ser guhê babê xwe ,eve pitir jidû sale ez birêve û heta nihu min çî paşeroj nîne !!!

Êkê dî nehêla ew çîruka xwe bidirusitî bigehînte dawiyê:

- bira tu xema ne xwe,biçûkên te yên limala babê te. pa tu bu min çî dibêjî?

Min xwelî bixwe werkir,hemû ^tên xwe firutin û xwe deîndar kir û biçûkên xwe ji xwandingeha kirin û nihu ew yên mayne liukirayîna,li wê duzexê,birs û tirs û rêya nexuş û eve ez ketîm vê kempê,ne pare û ne diême wergirtin,û ne destê me digehte êk.ya min mirine!!

- bira,ya te jî rê lê diçit!hûn bu wî xwelî serî çî dibêjin? ewê car biçûk bi jin ve dideriya îce da xendqîn?!

Yan ewê nihu kelexê wî dinaf mîna da liser tuxîbî genî buy??!!

-her ^tê bête serê me,ji ne têgehştina meye.her welatê licîhanê nihu pire jikurdan,her rê û rêbara hebit nihu pire jipenabera.em hemû lixuşyên xwe digerin.

me xuşî divên!Bêy em biwestin,kesê nevêt çi zehmetê bibit beramberî jiyaneke xuş ,liwelatê xwe !

Axivtin û çîrok,bune ger û dûr,her kesê diviya çîroka xwe vegêrt û bu hindeka bu kul û ma didilî da,lê şevên dirêj hêştta mayne û kumbun dê her berdewam bin.

Wî tulazê jinû hatiye jora wan,guhê xwe dida axivtinên wan,lê çi axivtin ne dikirin .

Piştî demekî gut:

-erê hûn çi kesin?

-em kurdin,kurdên îraqê.

Êkser gut:

-ez jî kurdê îraqî me!Pa bu ez dihewe naghem? hemû pêkive kenîn

-ez kurdê kerkukim,lê bara pitir jiaxivtina hewe ez tê nagehim.

Dujmnên wan şiyayne zimanê wan cuda bikin,ka çewa axawan cuda kirîn!!

ewjî hat birex wan ve,û pitir xwe westandin da bizaravê wî biaxivin da ew jî beşda^ disuhbeta wan da bikit,û bune xêzanek.

Sê çar rojeka man diwê kempê da,paşî her çendek birexekî ve birin.

Simku û şêrku û hindekên dî ketin digel êk û birine kempa "rutlingin" .

Kempeka berfireh û mezin,tijî mirov ,jihemû renga.

eve kevne baregayê leşkerê emrîkanî bun .nihu çihê penabera ye.

Dijoreka mezin û bê seruber,digel hindekên dî akincî kirin.eve dê bite mala wan bu demekî dirêj,divêt bibin êk xêzan,rabîn û rûniştina wan,xwarin û nivistina wan, digel êke.her kesek jibinemalekê jidurhêlekî,jipileka taybet.

evê rexê wî yê çepê,kurê pêşimergekê kevne.jiyana xwe hemû bişureş û derbederyê ve burandiye !

ewê liser textê rexê wî yê rastê,serbazekê tupa yê rijêma îraqê bu... wek wî digut,liserhildanê hizar tup yên linav bajêrê wan, bajêrê duhokê dayn.

ev gutine digutin bikenîve.. her wekû yarî dikirin,qed hest ne dikir,wî biwan tupa hizar xelkê wa yê bê guneh kujtîne!!!!

evê dî xelkê îranê ye ,ewji şufêrê firuka bu !

Wek wî digut,li şere navbera îran îraqê da,hizar cara hê^ kirîne ser gund û bajêrkên Kurdistanê...

wî jî çîroka xwe biserbilindî vedgêra.her wekû çîroka rustemê zal....

ewên dî ku jivan dicudane,wek jiyana wan,hemû jiyana xwe bidijatiya kurdave û xiyanetkaryê û pare kum kirinê ve burandye .

Nihu ew jî bira û hevalên wanne!

Êk hîvî û êk paşeroj.

Gelek cara dijatiya şureşê û şerulêkdan digehşte jora wan.lê hizar şureş û hizar welat kurî paspurteka ewrupê bibin!!!

Kurî jiyaneke tena lichekî xuş û bê kuştin bin.

Gelek tişt jibîr kirin,dinav pêlên jiyane da berze bun, gelek tişt liser xwe qebûl kirin,hemû wek kurên day û babekî lê hatin,hemû bune êk ast û êk qîmet.

rwşenbîr û Mamusta,xudan şyan,derçwyên kulîja.digel derçwyên kulan û girtîxana,di gel nezan û xwefiruşa, digel mêrkuj û patuxwera.

bibun bira û heval,liser mêzekê nan dixwarin û linav nivînekê dinivîstin....!

Gelek cara dinav suhbet û axivtinê da berze dibun.gelek cara xwe jibîr dikirin,heta ew cudahya dinavbera wan da jibîr kirîn.

Liser hindêk divin bilindyê ra,liser hindêk xweperstinê ra,nihu diêk çarçûvedanin,bivên nevên,dê bihindêk kêmasiya razî bin,da jiyân digel hevala bidumînt.

ev jore wek jorên girtîxana ye!!Textên liser êk,û her deh kes dijorekê ve,xizmeteka bê seruber,jiyaneka,nemirin ne jiyân!Raste xwarineka bê minet,lê ne wek xwarina ew liser fêr buyn .

Jiyân digel gelek rengên mirova.

serxoşa ,diza, mirov kuja, nesaxa, dîna, hara

her rengê didiniyayê da,nihu livê kempê amadeye.

heta berê sipêdê neşên bmmn jiber dengê serxoşa û yarî û keni û carji şerulêkdana wan.

Bişev lêk kum bun,û behsê hatina xwe û paşeroja xwe kirin.her êk jiwân,jivanek bu hatibu dana jibu dadkirinê. ev dadkirine dê rêya jiyana wan diyar kit.

Lişeva êkê li mala wan ya nû,nivistin gelek ya bizehmet bu,piştî gazindên wan hevala bu wan kirîn,ewên hatîne seredana wan,eve berî çend salane hatîne vî welatî.

hatin nik wan û harîkariya wan dikirin û gelek rê nîşa didan,ewjî ne dirazî ne ji jiyana xwe ,her kesê ji welatê xwe derket,dê tuşî gelek

nexuşiya bit,heta mirov binecih dibit û ziman û şula bizanit,dê biçûkên mirovî tuşî gelek şaşya û vêrî jiyana wan bin,eve bu wan dest nadit.

Mêvanekî rê vekir û gut:

- kurê me liser rêbaza me Namînit,kiç,yan divêt di kevlujankê xwe da bit,yan jî dê jidest xudanî derkevit!!

-eve pitir jideh salane ez jiwelatê xwe dûr.nihu biçûkên min zimanê dayka xwe jibîr kirîne,ageh jiwelat û milletê xwe nîne ,hevalên wan elmanin,jiyana wan wek ya elmana lê hatîe ,ez neşêm çi destkaryê dijiyana wan û paşeroja wan da bikim.hema ew û bextê xwe ,ez wek peykerekî me dimalda.

Êkî dî gut:

-erê bawer bike,kiç bu me ne male,kur ne kurê meye. yên vêrî jiyana wan buyn,em gelek jipaşeroja wan ditirsin !!

- kiça min,digut ,ew kiça hevala min, ewa dihate mala me.wê digut, babê min her şev dinivîna min dinivit,û zuryê limin dikit,ez ya buyme hevalawî....

-erê, erê raste,wî kurê hevalê kurê me jî digut,ez gelek cara digel xuyşka xwe dinivim,wek jinka mine !!

- vêca bira ma dê çewa em şên dinav van nimuna da jîn??!!

- bawer biken jiber pare û maldaryê,gelek jime deh roja carekê digel biçûkên xwe nanî naxun.em her nizanin ka ew çi dikin?Û kîve di çin??

-eve hemû lisererekî û ewa mirov dînê xwe tîtalên xwe jidest bidet.

hindek dê pîrejneka van welata markin,da bimînin,û geleka jinên xwe berdayne da parên wan zêde bin, geleka kiçên xwe markirîne da pê bînine ewrupa,geleka jinên xwe kirîne jinên rêbera heta gehandîne vêrê û hinda xwe kire fele û hinda xwe kire ereb û hinda jî xwe êkcar jibîr kirin jibuna pare û manê livan welata....

Lihemû rexa ,xwe jibîrkirine û xwe berze kirine,gelek ji me bidirustî yên hatîne helandin dinav civakê van milletan da !!

hizira simku jidîwana wan dizî.bire guvenda dayk û baba.bire ber landika sava,bire dirêya peşêmanyê da.

" eve min çi kir?eve ez bu çi hatîme heker eve paşeroja biçûkên min bit?

eve bu cîhana min xewin pê didîtin?Dê çewa bersiva hevala dim?Dê çi bêjime dayka xwe?Babê xwe?

ev mirove hemû jijiyana xwe ne dirazî ne,lê kesê ew dil û mêranî nîne bizifirit!

Kesê nevêt bibite pêtirankê neheza.kesê nevêt xwe gurî peşêmanyê bikit .

Peşêmanî û lêvebun û revîn,li nik milletê me,tişteke reşe. bê qîmete,bila xudan biserumal tê biçit,lê bila ji nîva rê ne zifirit....!

Lê mêvaneki hizira wi carekadi kêşan diwanê û gut:

- liser vê hemiyê,hindek hene şiyayne xwe û biçûkên xwe biparêzin û paşerojeka geş bu xwe û biçûkên xwe dirust bikin û her liser bîrubawerên xwe mayne.lê ev

Kese gelek dikêmin !!

Şeva wan bivan gutina û gelek suhbetên dî ve burî .

Dilê wan her yê hizar awaza lê didet.xew nema, peşêmanî hêştâ mêvanê geleka ye.

Ya jismku ve ,ew bitinê van hizira dikit! Wesa diyar bu ku mejyê hemiya gelek yê westiyay bu.hizira tama serketina wan berze kiribu.ew serketina eve car pêniç heîve xebatê bu dikin! ew serketina eve nîveka jiyana wan,hizir û plana bu didanin !!

Xew jisimku sil bu,car jî wek diza lê dibu mêvan,hizira şiya bibine ber sîngê dayka dilsuz,carjî dibire ber landika sava,ewa dibîst rojî da hêlay û bidûv serê xwe ketî.

car jî dibire beramberî dadwerekê,"nazi" jipaşmaykên hêtlerî!!

"--divêt te liser piştê bikêşin,heta tuxîbê welatê te !

Tu mirovekê xwe persitî ! Te kes nevêt jigiyane xwe pêve! Te çewa ew dayk,ew bab,ew jin,ew biçûkê bîst rojî hêlan û hatye xuşyên xwe?!Tu nizanî me biyanî nevên??!!Me ser reş nevên??!!

heta tu saxî divêt tu xuşyê livî welatî nebî!! "

Lê dengê wî serxoşê kes nizanit ka çi kul didilî da mayne,ji wan tengaviya rizgar kir. Sipêdê zû,dû hevalên wan çun berif cihê dadgehê.

evro dê paşeroja wan diyar bit,evro dê bihayê wê xebat û wan pilana diyar bit .ewên wan gelek bu kirîn.

hindek jî çun dixitur û lê geriyana nexuşya û hindek pirsiyarên polîsa û murkirina til û desta û wergirtina hindek pêtiyaya û xwarin û vexwarinê.

- deftera rojanên min ya berze buy!

ez nizamim likyveye?eve gelek ^tên min berze bun!!

ez çi bikim?!Dê çewa serhatiya evro nivîsim??!!

-eve ye deftera te?ha..haha

Bikenyeka girêt û didanên rizî ve ,hindek kaxezên sipî û hindekên nexşandî kirine didestî da û patika xwe dayê.

-herê, herê, te ew jî gurî xwe kirin?!Wekû te ez gurî xwe kirîm??

- buçî babu min tu gurî xwe kirî?!heker ez nebam, nuke tu dîn û har bibuy !!

-erê jiber wî karê te ez fêr kirîmê??

- belê,ji ber hindê,heker ew neba,da çewa vê diniyayê û xemên giran jibîrkî ???!

- raste,min diniya û xemên giran ji bîr kirin!!Belê min xwe jî jibîr kir !!!

-ev nave û pêzanîn yên tene?

Piştî ew kaxez jiwî ziman zanê birex simku ve rûniştî wergirtîn û bidevekî bişkurî ve ,ev gutine bu ziman zanî gutîn,da ew bizimanê wî bu bêjit.

- belê, yên minin.

- te çi zêdey û têbînî liser nînin??

- nexêr.

-her şaşyek hebit,tu berpirsiyarî!!

- bila.

- dê livêrê îmza bike.

- başe.

- nihu em dê êne ser babetê serekî.

Simku serê xwe hejand,anku ez amademe.



- te jiber çî welatê xwe hêla û hatye vî welatî? Bu min bikurtî bersiv bide!!

ev çend gutine arastey wî ziman zanî kirin û wî jî bu simku dûbare guhartine zimanê wî .

Wek sê guşeyekê lidûr wê masa biçûk dirûniştî ne ,her wekû dikumbuneka hevalînyê da .

Bîra dadiwer û polîsên welatê wî hate bîrawî .

Piştî mirov jiqutan û lêdanê hêr dikirin.piştî mirov ji mirovayetyê diêxist.piştî çî hizir û mejî ne d^lan.piştî mirov dibu kaxezeka sipê.û wî wek xwe çî diviya liser di nexşanid.digut:

-eve nav u pezanînen tene?

-eve hemû naven hevaien tene?

-ev kare hemû hewe kirîne?

- kese bizurî ev gutine jite ne wergirtîne??!!

- tu amadey liser van gutina îmza bikî?

- de jipêş çavên min bibin !!

Û edî çî çava ew ne didît !!!!

ere eve em heta çî rade dipaşivemayne ?em de çewa ene reza van?

- çîroka min gelek direje ,ez bu te çewa dest pe bikim?

-ew tiştê fer,ew egeren te ne şiyay liwelate xwe bimînî, bu min beje.

-eger gelekî,le min divet ez jiyana xwe jidestpêkê şiruve bikim,çunke hindek egeren kevin carekadî nû buyne,divan sala agire wan xuş buye ve,digel hindeken nû tekêl buye

- tu azadî,te çewa divet baxive,keremke.

Bu simku dergehe suhbete ve bu,û biserda cu xware:

-partayetî..rekxistinenineenî..şureş..huzan..rwşenbîrî  
blavuk..kuştina tevayî..sutina gunda..pertuken markis û  
lenîn..girtîxane....!!

Deve ziman zanî hişik bu . dadiwerî dûse cara eniya xwe perxand,  
xewe dil le xav kir. Simku zanî sere dadiwerî lê bu êş.le her  
berdewam ma liser axivtina xwe .

Xwe jigelek kesen nihu paşeroja milleta didest da giring tir dana.  
her wekû dadiwerî diviya simkuy ji ve xwe perstine rizgar bikit, gut:

- nihu em jive çende razî bun...tu dişêy bu me behse hatina xwe  
bikî?

Tu çewa hatî?Ke tu înay?Bi kîj re hatî?Le bikurtî hîvî ye!

- piştî ez wek "ramboo" jizîndane revîm,min qesta tuxîbî  
kir.libazare reber û mirov firuşa,êk jiwan ez kirim dipaxla xwe  
da,piştî paxla min vala kirî,û ez jituxîbî derbaz

kirim. listenbule ez danam,liwere ji eke di ez wergirtim,piştî  
min ew ji razi kırı,eş lisîmerxekê siwar kirim û beref vî welatî,û nihu  
ez dinav desten te danim!!

Dadlwerî çi jivan gutina bawernekirin.lê serê xwe hejand û hindek  
tişt nivîsîn û digel wî ziman zanî axivit û bibişkurîn ve gut:

- tişteşek dî heye tu bêjî?

- nexêr.

- nihu dê bu te dûbare gutinên te xûnin,heker têtînyek, yan  
zêdehyek hebit,tu dişêy diyar kî.û didilê xwe da gut:

"kes jimilletê te pitir pêtivî mêtaniya te nîne,lê heker rast bit!!"

Wî ziman zanê eve pitir jicar demhijmêra ye,guhurîna zimanî diket,axivtina wan hemû carekadî xwand,liser kasêtekê jî tumar kiribun!

heta simku jidil jê razî buy û dibin wan gutinada carekadî îmza kir.

Dadiwer carekadî cu destê smku û daxwaza serketinê bu xwast.

simku beref kempê hat.

heval hatine berahya wî,her wekû ji zîndanê derketî. ka wî çi kirye,çi gutye,dûbare û sê bare,bu wan jî gutin.

hinda gutin başe û hinda gutin ne başe.

Man diwan suhbetada,heta buye şev,lê şeven dirêj û rojên bê kar,jigelek tişta bê bar

kirin.

Ne xwandin û ne nivêsin,ne guhdariya deng û basa û ne dîtina heval û kes û kara û ne û ne

Cih û geriyanên wan jî wek wan bê tame.

Serma û giranî û cudahya jiyane û cudahya hizirî û...û...

Çayxanên wan jî,wek jiyana wane.

Ne dengê lêkdana peyala,ne dengê çigarfruşekî,ne çeçqeça tizbiya dizenda pîremêrekî da,ne dengê bûyaxçiyekî biçûk diet...

Pist pista pîrejna,mejiya hêr dikit,bê dengiya jiyane xûna dila dirawestînit. herwekû eve ne çayxane ,herwekû eve ne cihê rûniştin û suhbeta...!

Wek gurstanê ye,tinê dengê gewrîyên wan diêt,demê qurça liwan vexwarina didin . Bêhna wan livan ciha naêt,bêhna wan bêy heval, mirov,

deng,livîn,kenî,girî,yarî,muzîk.naet..

Liser hemû kul û xerîbiya wan ra,başeroja berze.

Dizifiruka dijwar da,ew hîvyên bu hatîn,berze bun, paşeroja wan hizir dikirin nema .

Barê wan giran bu,xemên wan zêde bun,pirça wan sipê bu.

Man lihîviya wê ayata pîroz jiesmana bu wan bête xwar. lê gelek gîru bu...!!

hindek bune hevalên diza ,hind bune bêhin kêş,hind serê wan sivik bu û hind liser cihê xwe çav lê sur bun!!!

Piştî demekê dirêj,ew ayat jiwê bilindahyê bidestên cibiraylî liser wan hate belav kirin!!

Têda hat xwarê :

....Binavê yeksanyê,binavê mirovayetyê,binavê yasayê, binavê dadiweryê.me ev biriyare dan,ûliser hewe ,hûn bidirustî bicih bînin...

- nabit hûn jipirsa bimirin!
- nabit hûn jitirsa bimirin!
- nabit hûn jiderve binivin !
- nabit hûn jivî gundî derkevin !
- nabit hûn karbkin !
- nabit hûn bixûnin !
- nabit hûn kesê bibînin !!
- nabit hûn behsê jin û biçûkên xwe bikin !
- nabit hûn çi hizira paşeroja xwe bikin !

- bixun,vexun,binivin,rabin,rûnin,diwê çarçuva me bu hewe diyar kirî,heta em biriyara nemana hewe didin!!!

Simku pitir jigelek hevala xwe ragirt.lê her digut:

-erê eveye ewrupa?eveye pêşketin?eveye mirovayetya wan?

erê çi cawazî dinabera me û wan da heye?em mirova bi aşkera dikuji,ew binepenî !!

em diziya jixwe dikin,ew diziya jime dikin!Wan divêt her em dipaşvema bin,lê ew gehştin stêra!

eve min çi kir?eve çi hat serê min?

Diwê zifiruka pirsiyarên bê bersiv da,ma hilawîsitî,hemû tişt jibyra wî birin.

ew pertukên wi xwandin,ew romanên wi jiber kirin,ew hozanên wi bu hevala

dixwandin,ew çirokên jixinkên hejara dinivêsin...

hemû bune xewin,bune aşup û berzebun.

Liser hemû diltengî û xemên wî ra,wê tuza sipî,ewa weku rwyên kiçên wî welatî dişya gelek şeva heta nîvro simkuy dikabîneka telefunê da binivînt !!!!!!!!!!!

Ji 26-6-1997 heta Şeva 14 -1 - 2001 min nivîsîye û pitir jihevî cara Guhartîye û eve nîvişkê dawiyê ye...

Li 20- 2 - 2002 liser kumputerî hate nivîsîn Nûrnberg 26 - 12 -2002 bidawî hat... hesen îbrahîm

\*\*

EVÎN Û ŞEWAT

Sidqî Hirorî

NÛDEM

EVÎN Û ŞEWAT

EVÎN Û ŞEWAT

Sidqî Hirorî

ROMAN

NÛDEM

Weşanên NÛDEM 40

Evîn û Şewat

Stockholm: 1998

© Weşanên NÛDEM

Pergala bergê û tûpelan NÛDEM

Wêneya bergê: Karanî Jamîl

Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri

ISBN: 91 88591-40 5

Box 177

177 23 JSrfilla-Sweden

Tel û Fax: 8-580 131 61

8-583 564 68

Diyarî bo Idrîsê Cercîsî (Ehmedê Kadir)

S. Hirorî

I

- Tu berê xwe bide keça hanê çend şîrîn e, Serdarî ji Hevalî re got û di ber re çaya li ber xwe bi kevçiyekî biçûk têt veda.

- Ew ji Duhokê ye, Hevalî bersiv da û berê xwe da saeta xwe. Ha dê dersa min dest pê bike, bi destûra te, divêt ez biçim.

- Baş e bira, Serdarî got. Tu bi xêr biçî.

Serdarî, heta digel çayvexwarinê jî, çavên xwe ji ser wê keça

ciwan ranekirin. Tişteki hêzdar di wê de, di dêmê wê de, Serdar ber bi xwe ve radikêşa. Wî bi çavên xwe ew ji kulovanka serî heta binê pêyan çerand. Keçik ji xwe re li ciyekî vala geriya bo ku lê rûne û çaya xwe vexwe. Ji hemî ciyên vala, yê bi rex Serdarî ve hilibijart. Wî weha hizir kir ku hêza berêxwedana çavên wî, ew bê hemda wê, rakêşa û anî cem wî. "Heke çima ji hemî ciyên vala yê bi kêleka min ve girt", wî bi vî awayî teoriya xwe selmand. Wî ev pirsê hêza kartêkirina çavan di pirtûka Colin Wilsonî "Wexerek ber bi destpêkê" de nas kiribû. Tê de Colin qala xwe û hêza mirovî ya heştemîn dike ku di çavên wî de hebû û çawa ew hêz di kêm kesan de peyda dibe. Wî, piştî xwendina pirtûka Colinî, bi xwe ew hilişkiftina Colinî ceriband û carna ku keçek li pêşiya wî biçûya yan li ciyekî rûniştî û piştî wê li wî bûya, wî çavên xwe rik dixistin ser bin guhekî wê, û bi taybetî bişkojka guhî û çavên xwe ji ser ne dilivandin heta ku wê keçê serê xwe dizivirand û li pişt xwe temasa dikir, heçku kesek wê neçar dike ku berê xwe bide pişt xwe. O her ji ber hindê jî wî bawerî bi hebûna wê hêza çavan dikir.

Wê periya ji ciwanîyê tîrhavêj, dêmê wê yê gilovir yê wekî heyva geş ya çardeşevî, hinarokên rûçikên wê yên sor û spî, wan reşçavên mezin û mestker, wê bejna dirêj û navtenga zirav, wê şepalê, şoxê, dilê Serdarî bi çavdîtina yekemîn dagîr kir.

Digel çayvexwarinê keçê rûpelên pirtûkeka xwe vedidan, herweçkî wê ew bi serpillî dixwend. Piştî çendekê, wê hest pê kir ku çavên wî xortê bi rex wê ve ji ser wê ranabin. Pê zanî ku ew bê vebirîn temasayî wê dike û çavên xwe li hemî

endamên laşê wê digerîne, wekî kesekî temaşayî mitayekî, berî kirîna wî bike, wî jî bi çavên xwe seh dikire wê, bi çavên xwe laşê wê diçerand.

Wê hizir kir ku niyasekî wê ye, lewma wê jî çend caran hewil da bi dizîkî ve berê xwe bideyê. Lê piştî ku wê baş navçavên wî dîtî, ew ji xwe pişt rast bû ku wê, ew xort, berî niha, li çî ciyekî ne dîtîye. Xwe keçik nikarîbû têr temaşayî wî bike, ji ber ku dema wê dixwest berê xwe bideyê, çavên wê yekser hevrûşî çavên wî, yê ku xwe ji ser wê ne dilivandin, dibûn.

Ya rast, wê jî dest pê kir hest bi tiştê kir, heçku çavên kurikî tîrkivan bûn dihatin û bi canê wê diketin û ew jî bi xwe re niqoyî mestbûneka rûhî ya hevbeş dikir. Wê weha hest pê kir ku ew xort, ji bo wê, di wan gavan de, ne mîna hemî xortan bû, ew ji gelean balkêştir bû, xuşîmank û xwîn şîrîn bû. Bejna wî ya navendî, ya ne dirêj û ne kin, çavên wî yê qehweyî û porê wî yê reş û xweşik û himbiz, sifet bûn, wê pê, di xwe de, hest bi hebûna lawikî kir.

Serdar bi lênerîna çavan têr nebû û xwest pê re bipeyive û ew di hizra hindê de ma, ka çawa xwe pê bide naskirin û rêya axaftinê digel wê vebike. Wî hindî xwe niyasî bû, ew di warê jinan de xortekî şermokî bû, lê wê carê, wî di nav xwe de hest bi hindê kir ku ew dixwaze pêngavekê biavêje û şansa xwe bi kar bîne, hêzekê ji nav de ew pal da ku bibizive. Zû hizrek hate serî. Pirtûkên xwe ji ser mêzê rakirin, bi herdu destan girtin û ber bi keçikê ve livî û her wekî dê ji çayxaneyê derbikeve. Lê ku nêzîkî keçikê bû, bi zanîn pirtûkên xwe ji destên xwe berdan, bi awayekî weha ku bikevin ber



pêyên keçikê. Yek ji pirtûkan kete ber lingên wê yên heta binçoka tazî. Keçê, ku dît pirtûkên wî xortî ketin ber lingên wê, bê hemda xwe, wê xwe nişîv kir bo ku pirtûka xortî ya pir nêzîkî lingê wê ji erdî rabike û bide dest wî û her di eynî gavê de Serdarî jî xwe nişîvî pirtûkên xwe kir bo ku wan rabike. Wî hest bi bêhna wê ya mê kir xwe di nêrîniya wî ya têhnî wer dike. Destên herduyan di yek demê de gihastine wê pirtûkê û her di wê gavê de çavên wan jî berhingarî yekûdu bûn. Du sê sentîmetrek dûratiya di navbera çav û dêmên herduyan de bû. Diyar bû ku kartêkirina çavan ji her perçeyeka din ya laşên wan bi hêztir bû, çinkî herdu di çend çirkeyan de, di deryaya çavên hevûdu de man niqobûyî. Di wan gavên kurt û pir hessas û bi tam de, laşên herduyan gelek ariyan û sîpelên şilqên û rahejiyaneka rûhî ku rengdana wê di laşî de berçav dibû, di nava wan de berbûn û rakişyan. Serdarî bi kurdî gotê:

- Bibore... û paşî û her wekî xwestî diyar bike ku ew nizane ku ew kurd e û ku kurdiya wî bê hemda wî hate ser zimanê wî, lewma bi erebî got:
  - Aha, ya ji min ve tu kurd î.
  - Rast e, keçikê got. Ez jî kurd im.
  - Tu bawer bike hema dilê min digote min ku ev keç kurdeka xwerî ye, herweçkî dixwest delîveyî ji dest xwe nede û wê zû bikişîne bo bihevreaftinê.
  - Min hizir kir ku tu min diniyasî lew tu hind temaşayî min dikî, keçikê ev bi bişkurîn ve got.
- Serdarî pir ji xwe şerim kir. Herçend bû, wî dixwest, dema hêj ew rûniştî, ew jî temaşayî wî bike û bizane ku ew mijûlî

wê ye û ew jî bi wî re, bi çavan, wekî piraniya peywendiyên keç û xortên dewrûbera wî ku bi hindê dest pê dikin, peywendiyê çêbike. Lê xuyakirina keçê bo wê rastiye bi zimanê xwe û rû bi rûyê wî ew vecinîqand. Xwêdanê laşê wî girt, şermê ew xiste bin tayê xwe û dev lê alizî dema wî gotê:

- Bibore, ...min jî wisa hizir kir ku em yekûdu diniyasin û min ji ber hindê jî berê xwe da te.... bes..., pa hemcara em derketin niyase hevûdu.

- Ew çawa? Keçê ev pirsyara xwe bi hêbetbûn ve kir.

- Manê em herdu kurd in û em kurd jî wek yek malbatê ne, ma ne?

Keçê li wir çî negot, lê bes bi girnijînekê lê nerî. Paşî, heçku ji nişkan ve tişteki giring ketiye bîra wê, temaşayî aliyekî çayxaneyê kir û zû ji ciyê xwe rabû ser pêyên xwe, pirtûkên xwe dan bin milê xwe yê rastê û got Serdarî:

- Ji destûra te, divê ez biçim, bi xatirê te.

- Bi xêr biçî, Serdarî ne ji dil ev got, ji ber ku ne dixwest wê derfetê, weha bi hêsanî ji dest xwe bide.

Ew ne gihast çî pirsyareka giring ku dixwest bersivê li ser bizane, jê bike. Çavên wî man bi dû wê ve. Bi rex deriyê ve xortekî reş esmer yê dirêj yê ku simbêlên wî yê bor ji her tişteki dîtir li ser dêmê wî xuyatir bûn, rawestiyabû. Keçik çû destê wî xortî. Her wekî civana wan hebû û ew li wê derê li benda wî rûniştibû. Herduyan milên xwe dan hev û ji çayxaneyê derketin.

Serdar ma di ciyê xwe de heyirî û dil lê çirmisî û ji yek tiştî tirsîya, "neku ew xort yê ku şiklê kesekî ji başûrê Iraqê dide, dezgirê wê keçikê be".

Ji xwe bawer ne kir ku wî ew gav avêt û xwe bisteh kir û karî bi keçikeka neniya re biaxive. Lê pir ji hindê ne rehet bû ku her tişt weha zû çû û ne gihast, hema çî nebe, pirsyara navê wê jê bike. Xwe bi hindê qayil kir ku hemî tist bi lezê çênabin û kes bi pilekê ne çûye serê milekê. Lê belê ew di hizra hindê de ma, ka dê çawa û kengî wê bibîne.

Serdarî, roja dîtirê, berê xwe da zankoyê, beşa Hevalî lê dixwend bo ku pirsyara wê keçê ji wî bike, ji ber ku Hevalî gotibû ku ew keç kurd e û ji Duhokê ye û Serdar bi wê hêviyê bû ku Heval navê wê û tiştine din jî li ser wê bizane.

Dema ku ew ketî di beşa matematîkê de, ew ciyê ku Hevalî lê dixwend, wî hind dît, ew keç ji polekê (sinifekê) derdikeve û ber bi deriyê têt. Wê jî, her ji dûr ve Serdar dît û nas kir. Ji dûr ve bişkurî. Ku nêzîkî wî bû got:

- Roj baş.

- Ya te baştir, Serdarî bersiva silava wê da û destê xwe yê rastê dirêjî destê wê yê rastê kir û gotê:

- Navê min Serdar e.

Wê jî bi destê xwe yê rastê bersiva destê wî da û got:

- Navê min Çinar e.

- Tu matematîkê dixwînî?

- Belê û tu?

- Kîmyeyê.

Bêhnekê herdu bê deng man û her yek li benda yê din ma ku tiştêkî bibêje û di wan gavan de xwendekar dihatin û diçûn û diviyabûya wan xwe ji ber rêyê vebidaya û ew ji ciyê xwe bilivîna. Serdarî xwe bisteh kir û got:

- Erê tu çî dibêjî bo piyaseyekê?

- Baş e, lê wextê min gelek kê m e.

Serdarî, li derveyî avahiyî, berê pêyên wê da bo nav wan baxçeyên kesk û guldar ku mizgîniya bêhinxweşî û ciwaniya bihareka ku dê zû bihêt, li ber hetava wê rojê ya xweş dida. Herdu li ser textedarekî rûniştin. Kêf û şermê Serdar mest 10

kiribû û peyv li ser zimanê wî li hev dihilngiftin û ne dişiya tiştêkî bibêje ku axaftinê pê, li gel wê xweş bike û bidomîne. Wî ne zanî ka ew di nav xwe de çawa ye, lew jî heyamekî bê deng ma. Keçê, berî wî, perdeya bêdengiyê dirand û pirsî:

- Ev çend sal in tu dixwînî?

- Sala min ya yekemîn e:

- Ha, lew me berî niha yekûdu ne dîtibû. Ev du sal in ez matematîkê dixwînim.

Serdarî xwest bibêje "nexwe tu salekê ji min mezintirî", lê leqek li zimanê xwe da û gotina xwe daqurçand û ne got. Her di wê gavê de eynî xortê roja borî, li wê derê xuya bû û gazî kir:

- Ha Çinar, roj bas, hevalên te got ku tu li vê derê yî. Ez piçekê zûtir hatim. Ma em neçin?

- Belê, Çinarê digel rabûnê ji ciyê xwe ev got wî xortê ku bangê wê kirî.

Du gavan çû û paşî bi çavên xwe li Serdarî zivirî û bi lêvên bişkurî ve gotê:

- Bi xatirê te, bila haya me ji yekûdu hebe.

Serdar bi çûna wê pir tingijî û dema çavên wî bi çavên wî xortî ketîn, wî hest bi kerb û kîn û torebûnekê li beramberî xwe, di çavên wî xortî de kir.

Ew xort li nik wî bû hevrikek. Hest bi dijminahiyekê li hember wî xortî kir. Ji xwe dipirsî "erê çima di van herdu carên ku min ev keç tê de dîtî, ev xort ji bin erdî derdikeve û wê ji min distîne?".

Serdar bi dilekî xemgîn ji ciyê lê rûniştî rabû û kete ser rêya di ber fekulta matematîkê re derbas dibe û bê ku bizanibe ka ber bi kî derê diçe xwe da rê û kete nav malxulyanan.

"Çima bextê min her ho ye? Keça ku dilê min çûyê, yan mêrê wê yan dezgirê wê heye. Lê wê got - bila haya me ji yekûdu hebe- û ev jî dibe ku nîşan be li ser hindê ku ez ketime

ii

dilê wê", gazindên ji vî rengî ji xwe û ji bextê xwe yê reş dikirin di wê dema ku milê wî tê de bi tiştê ketî û ew rahejandî û ji nav dalxeyan derxistî. Temaşa kirê ku Heval bû, wî bi enqest milê xwe li milê wî da.

- Te xêr e, te wisa serê xwe li ber xwe şor kirî û tu weha yê buximî û navçavtirîş î? Hevalî ew şêlka pirsyaran avêt ber Serdarî.

- Aha, Serdarî berê axaftinê guhert û got, baş bû min tu dîtî. Min pirsyarek ji te heye û hêvîdar im ku tu bersivê li ser bidî.

- Bêje bira, Hevalî got.

- Erê tu nabêjiye min ka tu çî ji Çinarê dizanî?

- Çinar!? Çinar kî ye? Hevalî weha got û paşî her wekî hatiye bîra wî ka ew qala kê dike:

- Ha, ew qîza Duhokî! Te çî zû zanî ka navê wê çî ye! Te xêr e bira, hema bes dilê te ne ketibeyê?

- Nuke tu bêje min ka wê dezgirê xwe heye yan na?

- Ma ez ji kî ve dizanim. Ne ez xizmê wê me û ne jî li Duhokê

dijîm. Hema hat û çû ez û ew di fekultekê de dixwînin.  
Em bes navên yekûdu dizanin û danûstandina me bes silavkirin e li yekûdu.

Serdar bi wê besivê razî nebû û ji Hevalî bawer ne kir.

- Du sal in hûn di yek sinifê de û tu çî jê nizanî!! Min nuke bes bizaniya ka ew çî xortê reş esmer e, di wê dema ez wê tê de dibînim ew têt û wê ji min direvîne?

- Neku tu behsê wî xortê reşesmer, yê zirav û dirêj, xudanê simbêlên bor û reş dikî?

- Hema ew bi xwe ye, her wekî li ser pelên sor rawestiyabû dema ev digot. De ka bêje ka ew kî ye?

- Tu dizanî xwendekar û ji wan bi taybetî keç, zêrevaniyê li yekûdu dikin û behsê hevûdu dikin. Min ji hinek keçan guh lê bûbû ku ew dezgirê wê ye. Lê duhî keçekê digote xor-  
IX

tê bi xwe re ku ew xort birayê wê ye û serbaz e li Mûsilê. Ew car bo car ku teskereya wî hebe têt û wê digel xwe dibe geryanan bo nav bajarî yan pev re diçin mala xwe li Duhokê.

Te digot qey Hevalî bi wê mizgîniya xwe dinya hemî pêşkêşî wî kir. Bi terzekî ji qam derketî kêfa Serdarî hat û got:

- Ez bo vê zanyarî û mizgîniyê, te gazî çayvexawrinekê li çayxaneyê dikim.

- Xuya ye tu bi rastî dildarê wê yî?

- De niha dev ji hindê ber bide û were da em çayekê digel hev vexwin.

- Eger tu aciz nebî, spas ez nahê, Hevalî got.

- Çima? Çayek e, xwe ne çî ye.

- Bira te ya rast bivêt, ez ne wêrim gelek digel te bihê û

biçim.

- Tu ne wêrî bi min re derbikevî! Xêr e, çi bû ye?

- Ez nizanim çend jê rast e û çend jê derew e, lê têtê gotin ku tu û Dilşad û Şivan di rêxistineka nihînî ya siyasî ya kurdî de kar dikin. Ez jî naxwazim xwe nêzîkî çi bela û serêşyan bikim.

Bi bihîstina wê gotinê Serdar di ciyê xwe de hişik bû. Hevalî bi wê gotina xwe cilfek bi wî xist.

- Ez, em di rêxistineka siyasî de ne, Serdarî pirsyar kir. Ev çi axaftin in tu dikî?

- Ji min ne xeyide. Hemî xwendekar we û pispisa we her roj dibînin.

- Ma hevalînîkirin û axaftin û pispis di navbera hevalan de kirin siyasî e û nihînî û qedexe ye?!

- Ê bi Xwedê ez bi xwe nizanim, lê gelek xwendekar weha dibêjin û têtê gotin jî ku haya hikûmetê ji we heye. Min ji mêj bû dixwest bibêjime te ku haya we ji we hebe û li xwe miqeyyed bin.

Agadariya Hevalî ya dawîn dilê Serdarî yê ku bi agadariya  
13

yekemîn geş bûbû çirmisand û êdî nema li bîra Serdarî ku wî Heval bangî çayvexwarinê kiribû. Li wê derê ji hevûdu veqetiyar û her kesek çû ser rêya xwe.

14

Mala Serdarî li taxa Feyseliyê bû û ew tax dikeve bakûrê bajarê Mûsilê, nêzîkî rûbarê Dicleyî. Ew rûbarê ku wî pir hez jê dikir. Carna ku diçû ber lêva wî rûbarî, dixwest ku rûbar berê xwe biguhêre û wî bi ser pêlên xwe re, digel xwe bibe

wan ciyên ku tê de derbas bûye û bigehîne warên ku jê dizê  
û car jî ji Dicleyê dixwest ku qebûl bike ku ew jî bibe dostê  
rêvingiya wî di geryana wî de li dû birayê xwe Firatî, ku wekî  
wî ji eynî axê derketiye û herdu bi wê xêr û bêra xwe, ji  
serûkaniyên

xwe, ji axa ku jê dizên dûr dikevin, der bi der dibin,  
du rêyên cuda digirin, lê her digehin hev, hevûdu digirin ve,  
li kî derê be, li derbideriyê jî be, her têkilî hevûdu dibin. O li  
welatê xwe jî geşta xwe didomînin, bi serûkaniya xwe ve dimînin  
peywendîdar û dimînin girêdayî zageha xwe. Ew ji  
axa xwe venaqetin, jê bar nakin û çî cara wê bi yekcarî, bi  
hemî ve nahêlin, xêr û bêrên xwe jî her didinê. Wî hez dikir  
ku ew jî mîna Dicle û Firatî bûya, ji xelkî re, ji axê re weha  
yê xêrdar û bêrdar bûya.

Bavê wî Mehemed barhilgir bû û galîskeyeka wî ya bar pê  
kişandinê hebû. Wî, ji xelkî re, tişt û miştên wan bi pereyî, ji  
ciyekî bo ciyekî din vediguhestin. Bavê wî çil salî bû. Navçavên  
wî westiyana wî, nerehetbûna wî bi zû pîrbûn û kesîrebûna  
lê diyar ber çav dikir. Xwendina Mehemedî nebû. Bapîrê  
Serdarî ji ber destkurtiya wan û pêwîstiya wî bi hindê  
ku kurê wî arîkariya wî di şivaniya pezê gundî û karûbarên  
di nav bîstanan de bike, kurê xwe Mehemed ne şand  
xwendîgehê.

Lê rê dabûyê ku carûbaran biçe cem melayê gundî  
û çend dersan bixwîne û li hember wê dersdanê bavê wî co-  
\*5

tekî goreyên rîsî, ku dayika wî çêdikirin, pêşkêşî melayî dikir.  
Bavê wî digotê:



- Kurê min Miho, axa dê ji min bixeyide ku ez te bişînim dibistanê. Wî gotiye ku xwendin ne ya şivan û gavan û kerax û kurmanca ye.

Dayika wî Helîma bermalî bû. Sih û heşt salên xwe di jiyanê de derbas kiribûn. Ew piştî destpêkirina Şoreşa îlonê ji gundê xwe li devera Behdînan hatibûn Mûsilê. Dayika wî pêçe; ebayê reş û poşî, nedan ser laş û navçavên xwe. Ka ew li gundî çawa bû, li wî bajarê mezin jî weha ma; ji bilî cilkên kurdî û dersoka li ser serî çî karekî din li xwe ne dikir.

Birayekî wî yê ji wî biçûktir hebû, li pola sêyemîn ya navincî bû, navê wî Elî bû. Bavê wî ew bi navê bapîrê wî bi nav kiribû. Xwe dayika wî digot "eger bi ya bavê te bûya dê wî navê te bikira Hesên, ji ber ku ew navê bapîrê bavê te ye. Lê piştî bûna te bi çend rojan, hêj tu bê nav bûyî, zilamek li mala me bû mêhvan. Ew hîngê mamoste bû li dibistana gundî û wî pir hez ji bavê te dikir û mala wî li Bexdayê bû. Ew jî kurd bû û dema ji gundî vedigeriya mala xwe li Bexdayê, ew di rêya xwe de şevê li cem me dima. Bextê te wisa bû, ew mamoste, berî ku navlêkirina te ciyê xwe bigire, hat nik me û bi şev ma. Wî got bavê te ku bila navekî kurdî bide te û wî Serdar wekî nav bo te pêşniyaz kir. Bavê te jî gelek rûmet dida wî mamosteyî û gotina wî li erdî ne dixist û weha navekî kurdî li te hat kirin. Lê ew mamoste li Bexdayê ma û li wir mamostehiya xwe kir û êdî ne hat cem me û danûstandinên wî bi me re neman û weha bavê te navê bavê xwe Eliyî li birayê te kir".

Serdar gihâşt mal. Dayika wî, li hewşa malê, li ser şemilkê

bû, wê nivêja êvarî dikir. Piştî ku wê nivêja xwe xelas kirî, ew li kurê xwe zivirî û wê gotê:

- Kurê min xwarin durist e, bo te rûbikim?

16

Wî gotê:

- Ne yadê, ez dê ji xwe re piçek rakevim.

Avek li serûçavên xwe kir. Xaniyê wan du odeyî bû, ya biçûk ya wî û birayê wî û dayûbavên wî bû. Ya din jî ya kurdekî din û jina wî bû û wan zarok ne dibûn. Di odeya wan de sindoqên ji tenekeyî hebûn û tê de kinc radikirin. Çi qiryole tê de nebûn. Nivînkên nivistinê û codeliyên rûniştinê li kujiyekê li serêk bûn. Serdar ket hundirê odeyê, rûnişt, paşî xwe girêl kir ser nahlîka xwe ya isfencî. Çi qiryoleyên wan nebûn, çend nahlîkên wan hebûn, gelek ji mêj bû bavê wî bi erzanî kirîbûn, ne dihat bîra Serdarî ka kengî, lê wî hindî dizanî ew nahlîk her hebûn. Xewa wî, hewyana wî ne hat. Dest dan pirtûkeka xwendingehê, berperên wê vedan, ne şiya hizra xwe biêxe ser xwendinê, xeyidî û wî bi xwe jî ne dizanî ji çi. Pirtûk girt û danî ciyê wê. Ew bes bi canê xwe di odeyê ve bû, lê bi hizra xwe li derveyî wê derê bû. Du tiştan ew xistibû bin barên xwe; Çinarê û nûçeya ku Hevalî jê re li ser pirsaxebata wî di rêxistineka nihînî de gotî .

Wî nizanî çi bike û biçê cem kê û pirsyara xwe bi kê bike.

Wê gavê hest bi pêwîstiyeka mezin bi şîretvan û rêberekî kir. Cara yekemîn bû, ku ew di jiyê xwe de dikeve rewşeka weha, ku xwe tê de pir lawaz û bê heval û pişt bibîne. Şev hat û xew bi çavên wî ne ket. Xwe li ser teniştan, li ser zikî û piştê wergerand û çavên xwe niqandin, lê xew ne hatê.

Car kêfa wî bi hindê dihat ku ew xort ne dezgirê Çinarê ye, lê birayê wê ye û wê hizrê ew diarand û xewnên xweş bi paşerojê û xwenêzêkkirinê ji wê bûka Duhokî ve didîtin. O yê bi lez bû ku bibe ve roj û biçe zankoyê û Çinarê bibîne û xwe bêtir nêzîkî wê bike û hewil bide wê bêtir binase. Û hewil bide wê têbigehîne ku ew hez ji wê dike. O di wan gavan, di malxulyanên xwe de didît ku ew dibû mêrê wê û wan ji xwe re malek dadimezrand û zarokên wan çêdibûn û

17

ew hemî pêk ve bi xweşî û serfirazî dijiyan. Ji xwe dipirsî gelo ew çima, weha zû û bi çavdîtinekê, wî hez ji wê kir û viyan bi carekê hat û ew dagîr kir.

Car jî ji nişkan ve belavbûna nihîniya wan ew ditirsand û ew bi guman dixist û weha li wî fikir ku ji xwe bipirse: "Gelo ev xelk çawa van nihîniyan dizane? Neku Şivanî nihîniya me bo hevaleyê yan hevaleyê xwe eşkere kiribe!"

Wî weha dizanî ku Şivan xortekî devberdayî ye, ew li ber du tiştan ji hêza xwe dikeve û teslîm dibe; keçan û ereqê.

"Hema keçek pê bike kenî ew dê xwe ji bo wê bike erd û hema ereq vexwar dê her tiştê ku dizane bibêje". Di wan gavan de Serdarî gazinde ji xwe bi xwe kirin ka çima wî qebûl kir ku kesekî weha bi wî re kar bike; "Kesê weha nabe bibe endamê rêxisitneka nihînî ya nelegal. Her ji destpêkê tirsê min ji wî kurî hebû. Min digot, hema Şivan li ciyekî ereqê yan bîrê vebixwe dê her kesê bixwaze gotina ji wî derbixe dê derxîne. Lê Dilşadî ew aniye û dibêje ku ew kurekî gelek welatparêz e û haya wî ji xwe heye. Nexêr, divêt ez komîteya karger pê bihesînim hêj ne bûye dereng".

Wî biryar da ku ji yê bi ser xwe de bibêje ku xetê wî yê rêxstina wan ya nihînî di bin şika xelkî de ye.

Serdarî ne dizanî ku ew hind yê tirsinok e û ji wî re diyar bû ku bîstehî û tirsinokiya mirovî di demên tengav de xuya dibin. Wî ne zanî ka wê pîrsê çawa dest pê kir. Lê hind dizanî ku ew karekî baş dike. Wî hez dikir ku tiştê bike ku pê hest bike ku yê xizmetê bo azadbûna gel û welatê xwe dike. Çima weha dikir? Niha, ji nû dest pê kir hizra xwe di hindê de kir ka ew bo çi kete nav bizava siyasî ya nelegal. "Lê ma ji bilî ya nelegal bizaveka din ya kurdî ya siyasî yan ya civakî yan ya pîşeyî heye?" Wî ev pîrsyar ji xwe kir. Car weha di xwe digihaşt ku wî dest bi wê xebatê kir bona ku tirs û şerma xwe pê biveşêre û bi hindê bikaribe bi ser wan herdu kêmasi-

18  
yan de zal bibe. Car jî digot xwe: "Xwe divêt hinek kes vê xebatê jî bikin û çima yek ji wan ne ez bim". Wî hinek ji destpêka netewebûna xwe vedigerand bo dayûbavên xwe; behiskirina wan ya berdewam bo ciwanî û şengiya gundê wan, wan çel û çiyayên deverê, siruşt û xwezaya xweşik û dilveker ya Kurdistanê, xerîbbûna wan ji wan wargehan, hezkirina wan ya bê sinor bo veşerê. Wêneyên sax yê bêhejmar yê zordariya desthilatdarê dagîrker bo ser kesê kurd yê ku dixwaze di kurdewarî û kurdbûna xwe de azad, li ser axa xwe bijît, hertim li ber çavên wî, di hizra wî de bûn û rolê xwe di şarandina kurdbûna wî de didît. Wî carna hest bi hindê dikir ku di mijûlbûna xwe de bi vê pîrsê, bi xebata neteweyî ve, xwe peyda dike, pênasnameyaxwe bi taybetmendiyan xelkê xwe zelaltir dibîne, şermê wînda dike, hevalên mîna

xwe nas dike û tirsê di nav xwe de difêtisîne. Çi kesî bi tirsê wî ne dizanî, heta yê gelek ji wî nêzîk ji hevalên wî jî pê ne dizanî. Ji bilî dayika wî ku wê kurê xwe ji hemî rexan ve bas nas dikir û ew ya ji hindê pişt rast bû ku kurê wê Serdar, ji tirsê, xwe tûşî çî belayan nake. Wê hez dikir ku kurê wê, bo ku bes ne keve nav siyasetê û çî bela bi serî ne hên, weha yê tirsinok be.

Dema sala xwendinê dest pê kirî, wî ew herdu heval; Dilşad û Şivan bi rêya dost û cîranê xwe Hevalî, li çayxaneyê zankoyê nas kirin. Serdarî xwe ji wan nêzîk dît. Herçend bû wî Hevalî her ji biçûkîniyê nas dikir, lê tiştên wan yê hevbeş ku li ser biaxivin kêmbûn. Tiştê ji hemîyan pêtir Serdarî hez jê dikir xwendina pirtûkan û munaqesê li ser wan bû. Wî dikarîbû yek pirtûkê bi yek du rûniştinan bixwîne, mîna romana Dayikê ya Meksîm Gorkî û gelek roman û pirtûkên din. Hindî Heval û xwendin bûn, ew erd û esmanan ji yekûdu dûrbûn. Lê her di rûniştina yekemîn de bala Serdarî çû ser hindê ku ew herdu birader; Şivan û Dilşad, wekî wî hez

19

ji xwendina pirtûkan dikin û zanyariyên wan yê giştî di her warekî de hene û weha bi wan re bû dost û pirtûk û munaqesê bûn pîrek di navbera wan de. Her weha Serdarî çî caran dostîniyê bi kurdên soranîxêv ne kiribû û her hez dikir ku dostîniyeka wî ya wisa hebe û ew derfet bo wî hilket; Şivan ji Silêmaniyê û Dilşad ji Erbîlê. Ya ji wî ve ew dê nikaribe wan fehim bike, lê piştî çend rojên bi hevûdu re derketin û axaftin û munaqeseyan, wan, yekûdu pir xweş fehim kirin. Bala wî çû ser tiştêkî, lê ne xwest bi giringî bigire; ew jî ew bû ku

herdu, lê bi taybetî Şivan, bes bi zaravê xwe dipeyvin û berûvajî wan, ew hewil dide bi diyalekta wan biaxive. Wî ew tişt bi dilxweşî dikir û hez kir ji dil zaravê wan bizane û dixwest biselimîne ku ew jî zimanê wî ye û wî çî gazinde ji wan nebûn li ser hindê ku ew bi zaravê wî naaxivin. Ya giring li nik wî ew bû ku ew di yekûdu digehin. Wî weha didît ku dibe ku egera hindê ew be ku zaravê soranî her ji destpêka sedasla bîstan û hir ve li basûrê Kurdistanê û li îraqê zimanê xwendin û nivîsandina kurdiyê ye û bi behdînî yan bi kurmancî nivîsîn pir qedaz e. Ya rast wî ev bi pirseka giring ne dizanî û her ne dixwest li ser rabiweste û hizra xwe tê de bike û ditirsiya neku ew şêweyê hizirkirinan bi xerabî kar bike ser pirsaw bawerbûnê bi yekîtiya neteweyî ya kurdî di hizr û nava wî de.

Carekê Dilşadî pirsaw xebata siyasî li dijî dagîrkerî, digel wî vekir. Ku wî jî hezkirina xwe nîşadayî, Dilşadî ji wî xwest ku eger ew kesekî ji rêxistineka nihînî ya kurdî binase peywendiyê digel bike bo ku ew û Dilaşad û Şivan jî bi wan re kar bikin. Cîranên mala Serdarî wan hebûn, ew jî kurd bûn, ji eşîra Sindiyan, wan mala xwe ji Mûsilê bar kir û çûn Zaxoyê. Wê malê kurek bi navê Naciî hebû, ew û Serdar yek temen û hevalên hev bûn. Ku Naciî dihate Mûsilê mala wan, wî hinek sîgnal didane Serdarî û digotê eger hebin kesên ku xo

dixwazin ji pêşmergeyan re arîkar bin, bila ew peywendiyê bi wî bike, ji ber ku peywendiya wî bi pêşmergeyan heye û ew hez dikin ku li Mûsilê û bi taybetî di zankoyê de hevalên wan hebin. Serdarî jî peywendî bi Naciî kir û weha xetekî rêxistinî

yê nihînî li bajarê Mûsilê çêkir. Li destpêkê ji wî û Dilşadî pêk dihat. Wî hez ne dikir ku Şivan bikeve nav xetê wan. Herçend li gor dîtina Serdarî ew kurekî gelek jîr û xwende bû, lê pirs li pey keçanbezîn û ereqvexwarinê, ku Şivan zor pê ve girêdayî bû, Serdar ditirsand, ku ew bibe belaya serê wan. Lê Dilşadî Serdar qayîl kir ku ew tirsên wî bê bingeh in û Şivan jî ket nav karê wan yê nihînî.

Ji bo agadarkirina her pênc endamên komîteya karger ya rêxistina xwe ya nihînî diviyabûya Serdar biçûya Zaxo, ji ber ku ew her pênc li Zaxoyê bûn. Serdar bi xwe di nav xwe de, li ser vî şêweyê xebata xwe, dudil bû. Carna weha li wî dihat û digot xwe: "Ya çêtir ew e ez dev ji vî karî berbidim, ez ne yê van şolan im". Lê ku digihaşt wan herdu hevalên xwe yê din, ew careka din gerim dibû. Serdarî tişteke dizanî, ku ew, wî karî, bi hemî jêrazîbûn û bawerîpêkirina xwe nake, lê dixwest jî yê beşdar be di xebata neteweyî de. Hindî wî kûrtir diyalog bi xwe re li ser hindê dikir, gumanên wî bêtir lê dihatin. Ew û çek û hêzbikaranîn dijminên hev yê sersext bûn û digel hindê jî endam bû di rêxistinekê de, ku zimanê hêz û dirb weşandinê li damûdezgeh û kesên berpirsyar yê dagîrkerî bi ser de zal û tê de li kar bû. Eva ha ew pir diêşand û wî nikarîbû bizane ka wî ji ber çî dixwest xwe ji wî awayê xebatê dûr bixe; aya tirs di nav wî de weha dikir ku ew ji xebateka

çekdar ya ku tirs girîng û mirinê tê de ye bireve, yan jî baweriya wî bi wê metodê nebû? Wî di nav xwe de bêtir bawerî bi rewşenkirin û rewşenbîrîkirina xelkê hebû, ku ew li ser mafên xwe wekî mirov û wekî netewe hişyar û agadar bibin

û li ser bingehê wê hişyarbûnê giş tex û çînên civakê, pi-  
XI

raniya xelkê wî, bi bîr û bawer û bi hişyarî û bi zanîn, her kes  
li ciyê xwe, li ciyê karê xwe, li mala xwe, li tax û rendeka  
xwe, li gundê xwe, li bajarê xwe, bi zanîn û malê xwe li dijî  
zordariyê, li dijî bindestî û dagîrkerinê, bi awayekî rêxistî, bi  
metodên aştiyane, bê çek, rabibin ser xwe. Di serê wî de hizreka  
hêj ne baş zelalbûyî hebû ku divêt ev eniya bersîngirtina  
dagîrkerî ji aliyê xelkê wî ve bête mezin û berfireh kirin û  
guhertin tê de bêne kirin.

Car jî diket di gumanê de ku ev metod; têkoşîna bê çek û  
bê hêza çekî, di welatekî wekî îraq û îran û Tirkiye û Sûriyeyê  
de, encamên baş û nêzîk bîne. Wî wisa didît ku ev desthilatdar  
dê berê çekên xwe yê kujek bidin rabûneserxweyiyan  
û dê heta kesê dûmahiyê jî, jê bikujin û dê gund û bajarên  
wan tarûmar bikin, nemaze eger dinya li hawara wan nehêt  
û mayê xwe di wê pêlênan û perçiqandina mafên mirovî de  
neke. Di warê li hawarhatina dinyayê jî ne yê bi hêvî bû. Ew  
weha têdigihaşt ku ev dinya; dewletên kenkene, eger ne ji bo  
berjewendiyên xwe yê taybetî bin, ne ji bo berjewendiyên  
gelên xwe bin, ew ji ciyên xwe nalivin, û hema weha, ji bo  
çavên mirovîniyê arîkariya milletekî weha tepeser nakin. Wî  
digot xwe ku dibe ew ji bo rûmetiyê, ji bo ku xwe wekî mirovhez  
binasînin tişteki bikin, lê bi ya wî çareserkirina siyasî  
ji bo pirsê xelkê wî yê bindest, welatê wî yê dagîrkerî ne xema  
wan e, kêmtişt di serûberê niha yê deverê de. Wî tiştê bi  
herî giring didît ku bibe egera bidestveanîna xelkê wî bo mafên  
xwe yê mirovîniyê û neteweyî çekê zanîn û ekonomîk e



digel yekîtiya neteweyî. Wan dîtin û hizirkirinên cur bi cur ew ji nav de aloz dikir û biryara wî jî di warê xebat û ne xebatê de gîro dikir. Lê pirs ji hindê derketibû û wî xwe neçar didît ku biçe Zaxoyê û komîteya karger bi wê suhbetê bide nasîn.

Diviyabûya berî ku biçe Zaxoyê pirs bi hevalên xwe Dilşad

xx

û Şivanî re munqêşe bikira, lê herdu, ku di yek odeyê de dijiyan, çûbûne nik xizmekî Dilşadî li Keleka Yasîn Axayî ku bi taksiyê saetekê ji Mûsilê dût e û du rojên din dê vebigeryana. Nedişiya du rojan xwe bigire û biryara xwe da ku biçe Zaxoyê û dixwest wî karî zû bi cî bîne û wî barî ji ser milên xwe biavêje. Wî di rastiyê de ne dixwest wan herdu hevalan bibîne bona ku, ew, wî ji biryara wî lê ve nekin.

Wî di rêyê de bo Zaxoyê di serê xwe de biryara xwe formule dikir "Hevalên hêja biborin, êdî ez nikarim di vî karî de berdewam bibim. Eger wan pirsyar ji min kir; erê gelo çima? Ez dê bibêjim, bi Xwedê, eger we ya rast bivêt, êdî min bawerî bi vî rengê xebatê ne maye û min bawerî bi van hemî partiyan jî nîne. Û ez dibînim ew pêtir şerê yekûdu dikin ji hindê ku şerê dijminî bikin. Dagîrker me bindest dikin û em jî yekûdu dikujin. Ez rêya xelasbûna me bi vî rengî nabînim. Eger ji min pirsîn; pa alternatîva te çi ye? Ez bawer nakim ew hind tê gihastî bin ku ew hizra alternatîva bikin, lê eger pirseka weha jî bikin ez dê bibêjim...dê bibêjim hema ez hez nakim êdî endam bim di rêxistineka nihînî de. Dê bêjin tu tirsinokî. De ka çi dibêjin bila bibêjin, ez naxwazim û hind"

Lê Serdar bi guman bû ku ev reftara wî ya durist e, ji ber ku di xetê wan de biryareka weha hatibû dan ku yê dibe endam, nabe êdî dev ji endamiya xwe berbide û dê heta mirinê endam be. Lê Serdar yê li ser biryara xwe rik bû û digot xwe "Çi dibe bila bibe, êdî ez çî xebata weha ya ku min bawerî pê neyî nakim".

Dilşadî gelek caran ew di rewşên weha de razî dikir ku di xebata xwe ya nihînî de berdewam bibe û wî Serdar bi axaftinên ji vî terzî razî dikir: "Gelek caran mirov hinek tiştan dike û bawerî pê nîne û naxwaze bike, lê pêwîst e ku wan bike û ji bona ku wan tiştan bike divêt mirov xwe bi hindê qa-  
X3

yîl bike ku ev kirina wî bo wan tiştan ji sexmeratî piraniyê ye û gava alternatîv nebe divê mirov wê bike ya heyî". Di tirmbêlê de ev gêngaşe di nava Serdarî de berdewam dibû û têkil dibû digel tirsza zalgehên (kontrolên polîs û leşkerî) di rêyê de. Ji wî ve hemî dinya bi karê wî dizane û hema ha ew di zalgehekê de ji tirmbêlê hat peyar kirin û girtin û perde bi ser jiyana wî de hat vedan. Carna jî dêmê Çinarê, bi bişkurîna xwe ya dilveker ve, dihat ber çavên wî û bo çend çirkeyan xema wî dihat revandin û di hizra hindê de dima; aya dê hemî tişt hêmin bibin û dê ew careka din Çinarê bibîne? Li Zaxoyê Serdar peyar bû û neçû mala hevalê xwe Naciyî, lê yekser çû bo mala Mîrzayî ku berpirsyarê rêxistina wan ya nihînî bû û mala wî li taxa Ebasîkê bû. Ew gelek caran hatibû mala wan. Wî destê xwe li derî xist. Pîrejinekê dergeh vekir, dayika Mîrzayî bû û Serdarî yekser ew nas kir û xwest silavê lê bike ku dayika Mîrzayî Serdar dît xirîqên pê ket û

yekser berda girî û xwe di Serdarî wer kir. Serdar ma hêbetî û tirseka mezin dilê wî girt û giriya dayika Mîrzayî ew ji kulovanka serî heta binê pêyan hejand.

Ku ew bi wê re ket hundirê xaniyê, dît ku tazî ye û kes û karên malê civiyane û Mîrza ne di nav wan de ye. Serdar ma şaş û ne zanî çî bike û ji kê bipirse ka mesele çî ye. Birayê Mîrzayî ku xortekî bîst û sê salî bû û bi du salan ji Mîrzayî biçûktir bû ji odeyekê derket, hat û destê Serdarî girt û ew bo der ve bir û gotê:

- Xwe zû ji vê derê rake û here hêj hikûmetê bi te ne zanî, heke dê te jî girin.

- Niha tu ji min re bibêje ka çî bûye, çî qewimiye? Ka Mîrza? Serdarî pirsyar ji xortî kir.

- Mîrza û herçar hevalên wî berî çar rojan hatine girtin û niha hikûmet li te digere, birayê Mîrzayê got. Diyar e navê te jî ketiye nav destên wan, ji ber ku duhî hatin mala me, ez M

li mal bûm û wan pirsyar ji min kir ka ez kesekî bi navê Serdarî nas dikim û ka mala wî li kî derê ye. Min jî xwe xişîm kir û ji wan re got ku ez çî Serdara nas nakim.

Ku Serdarî ev xeber bihîst, dinya li ber çavên wî tarî bû û xwe dît di birayardana xwe de derengmayî. Yek hizir di serê wî de ma, ka çawa xwe ji girtinê xelas bike û ber bi kî derê biçe û hawara xwe bibe cem kê. Yekser Şivan, hevalê wî yê rêxistinê hat bîra wî û wê gavê ew ji xwe yê pişt rast bû ku ev pirs girtina wan hevalan jî her ji wê derê derketiye, heke ma bo çî her di eynî wê dema ku xwendekarên kurd li zankoyê dest bi axaftinê li ser karkirina wan di rêxistineka nihînî de

kirî, hevalên wî yên Zaxoyê jî hatin girtin.

Biryara xwe dabû ku dev ji xebata nihînî ber bide û niha gihaste hindê ku divêt zû biryareka nû bide; ka biçe nav pêşmergeyan yan na û bi ya wî, wî di wan gavan de nikarîbû li ser pirsêka weha rabiwestiya û hizra xwe tê de bikira. Ew bi xwe biçe cem polîsî û bibêjeyê ku vaye ew bi xwe hatiye û wî di rastiye de ji bilî endambûnê çî tişt ne kiriye û haya wî ji çî tiştêkî din nîne. Lê ew li nik xwe yê ji hindê pişt rast bû ku ew jî nabe, ji ber ku li cem dagîrkerî bes endambûn bi tenê yan haybûn ji hinek kesan ku di rêxistineka ne ya hikûmetî de kar dikin, bi xwe gunehkariyeka mezin e û mirov li ser têt girtin û êsandan û zîndankirin û dibe xendiqandin jî. Wî ew jî dizanî ku pirs ne pirsê hindê ye ka rêxistin çekî bi kar rîne yan na, lê rastiya pirsê ew e ku di vî welatî de nabe çî rêxistinên din ji bilî partiya desthilatdar û kopî û dûvelankên wê hebin, yên ji bilî wan peyda bibin, divêt bihên ji nav birin. Opozisyon, berhingarî bi her şêweyekî be bila bibe, di vî welatî de qedexe ye. Haya Serdarî ji wê rastiye hebû. Wî dizanî jî her ew siyaseta desthilatdarî bûye palder bo ku partiyên kurdan jî her eynî zimanê desthilatdarî, hêzê û çekî di têkoşîna xwe de bi kar biînin û kurd berdewambûna hebûna

\*5

xwe di wê bergiriya xwe ya rûhî û çekdar de bibînin.

Di wan gavên hessas de Serdarî xwe dît di navbera nal û bizmaran de. Dengê dayika Mîrzayî hat guhên wî bi dengêkî giryokî ve dibêje: "Kur jî bi rêya bavê çû. Mergê min, kurê min, Xudê mala bêbexta xerab bike". Bavê Mîrzayî di dema berxwedana çekdar ya kurdan, di sala 1974<sup>^</sup> de, li meha îlonê,

li berokê şerî, li devera Erbîlê bi topeka leşkerê îraqê hat kuştin.

Dema wî xatirê xwe ji birayê Mîrzayî xwestî û ew hiştî û derketî derveyî xaniyê wan, hêj jî ne dizanî dê çi bike. Êdî derfetê hizirkirinê di wê pirsê de jî ne mabû, ji ber ku hêj deh metran ji xaniyê Mîrzayî dûr ne ketibû dema xwe dîtî yê bi asayîşan ve dormandor kiriye û ji her aliyê ve bi debance û qontaxên kilanşîkofên xwe ve, ew peyayên asayîşa hikûmeta îraqê bezîne wî. Ketine ser piştta wî, hest pê kir devê wî gerim bû û xwîn jê rişt. Dest lê hatine girtin û hate raxîşandin bo nav tirmbêlekê û ji ber lêdana ji her aliyê ve êdî wî agah ji xwe ne mabû.

x6

Çend roj derbas bûn, Çinarê Serdar tê de ne dît. Wê ne zanî çima ji hemiyar Serdar weha bi dilê wê ve nûsiya û hat û ew ji nav de vegirt, dilê wê, canê wê dagîr kirin. Wê hest pê kir ku wî Serdarî, weha zû, ciyekî mezin di nav wê de girt û xwe li ber wî bêhêz dît û nikarîbû wî ji nav xwe derbixe.

Ji xwe wê dizanî ku ev hezjêkirina wê bo Serdarî dê ji wê re gelek arêşe û sergêjiyan çêbike. Lê xwe didît girêdayî Serdarî. Wê dizanî ku ew nikare bi hîç rengê qala vê evîna xwe ji çi kesî re bike. Hêj ew di zikê dayika xwe de bû, dema bavê wê ew, bi sozdanekê kirî jina birazayê xwe Karwanî, ku berî wê bi sê salan ji dayik bûbû.

O weha peyman di anvbera herdu birayan de; bavê wê û mamê wê hatibû dan û li gor wê peymanê diviyabû ew û Karwan ku balixbûn bibûna jin û mênên yekûdu. Xwe, Karwan, bi dîtina wê, kurekî xweşik, rehet û bê bela bû. Lê pirs

di hindê de bû, ne Çinarê û ne Karwanê hest bi çi hezdariyekê ji bilî ya pismam û dotmamê, yan ya bira û xwîşkê li hember hevûdu ne dikir. Lê ew çend sal bûn, ew di guhên wan de dihat gotin ku ew herdu bo yekûdu ne û wê pirsê dest pê kiribû karê xwe di Karwanê de dikir. Êdî av di Karwanê de digere û ji ber ku ew kurekî pir ji xwe xelas û şermîn e, bistehiya xwe di çi keçekê de ji bilî Çinarê nabîne, ew li wê bisteh dibe, evca hewil dide xwe nêzîkî wê bike. Çinarê hest pê kir ku di wan dûmahiyên de Karwanê hestên xwe yê hezdarî û dildariyê bi awayekî îndîrekt arasteyî wê dikirin. Lê Çinarê di nav xwe de çi bersivdanek bo wan hestên wî ne didît û nikarîbû ji bilî birayekî wî bi renekî din binase. Dilê X7

wê çû gelek xortan lê çi carê ne çû Karwanê. Lê ji her kesî bêtir dilê wê çû Serdarî. Ew ji wê çendê pişt rast bû. Wê ji çi kesî re ne gotibû ku filan yan bêhvan kur ketibû dilê wê, wê çi cara bistehiya hindê ne kiribû ku heta bo hevalên xwe yê keç jî behsê hindê bike, ji tirsê neku bavê wê pê bizane û sergêjyan

ji ber hindê bo çêbike. Lê, wê, wê carê xwe didît ji nav de ya tête paldan ku bo kesekî qala wê evîna xwe ya hêzdar bike û ji wî bi xwe, ji Serdarî dest pê bike û rû bi rûyê wî bibêjeyê ku "Ez hez ji te dikim".

"Lê ka Serdar? Çima xuya nîne?" Wê ev pirsyar ji xwe kirin û ne zanî pirsyara xwe ji kê bike û jê bizane ka Serdar li kê ve ye. Wê hest pê dikir ku wê, gula ber serê xwe dîtiye û divê Serdar bi evîna wê bizane.

Çû çayxaneyê xwendekaran. Ew bo cara dehê yan yazdeyê

bû diçû wê derê, temaşa kir, lê Serdar ne xuyabû. Çaya xwe kirî û çû ser eynî kursîka ku cara pêşîn ku Serdar tê de naskirî rûnişt û temaşayî wî ciyî kir. Kirrên ji dilê wê hat û tirsaneku êdî ew Serdarê xwe ne bîne terzinkek bi ser laşê wê de berda. Ji nişkan ve bala wê çû ser Hevalî, di wê cara pêşîn de ku Serdar tê de dîtî, ew jî digel Serdarî bû, û ji bilî hindê Heval xwendekarê eynî fekulta wê bû û ji ber hindê jî ne kesekî xerîb bû. Lê şerim kir biçe û jê bipirse ka Serdar li kî ve ye û çima ne li zankoyê ye. "Biçim neçim" bi dehan caran ji xwe pirsî, paşî biryar da ku biçe û jê bipirse. Lê hêj ew ji ciyê xwe ranebûbû dema çavên wê bi Hevalî ketin, destê xwe ji wê re, bi silavê radike û ji ciyê xwe radibe û ber bi wê ve diçe. Ma heyirî, çi cara Hevalî weha ne kiriye û ne hatiye cem wê birûne û gote xwe belkî Serdarî tiştê gotibe wî ku bibêje min. Piştî silavê û rûniştinê Hevalî gotê:

- Te ew xort, Serdar li bîr e?
- Erê, wê zû got. Ew çima ev çend roj in ne xuya ye?
- Ez nizanim çawa bêjim, Hevalî weha got.

28

- Ya rast ez bo te bibêjim ku wî hez ji te kiriye. Ku Hevalî ev got hem kêfa wê hat û hem jî şerim ji xwe kir û serê xwe çemand.
  - Lê diyar e bextê Serdarî reş bû.
  - Çi? Çima? Ku Çinarê ew bihîst ev bi hêbetbûn ve got.
  - Diyar e te ne zaniye ku ew hatiye girtin, Hevalî got.
- Dema ew nûçe bi ber guhên Çinarê ketî laş û canê wê velerizîn û hest bi xwe kir ji hêzê dikeve.
- Hevalî pirs jê re şirove kir û ka wî çawa ji Dilşadî û Şivanî

bihîstibû, weha bo wê vegêra. Wê xwest wan herdu xortan binase û ew bi xwe bêtir, li ser Serdarî pirsyaran ji wan bike. Lê Hevalî gotê ku ew herdu xort jî ji xwe ditirsin û gelek li ber xwe radiwestin, herçend e ew bi bawer in ku Serdar navê wan nade polîsî. Lê Çinarê gotê ku divêt "Tu min bi wan bidî nas kirin, belkî ez bişêm arîkariya Serdarî bikim û wî bidim berdan". Hevalî dizanî ku bavê wê kesek e, li cem hikûmetê destçûyî ye, lê ew tişt bo Serdarî ne gotibû û wî xwe ji ber hindê jî, li hember Serdarî, bi gunehkar didît.

Heval bi wê re çû û li zankoyê geriyan û şiyar Dilşadî peyda bikin. Dilşadî ne got wê ku wî jî bi Serdarî re kar fikir, lê gotê ku dibe ji ber endambûna wî di rêxistineka nihînî ya nelegal de hatibe girtin û ew li Zaxoyê hatiye girtin. Dilşad, piştî berzebûna Serdarî çûbû Zaxoyê mala Mîrzayî. Ew berî hîngê jî carekê bi Serdarî re, ji bo karekî rêxistina wan ya nihînî çûbû cem Mîrzayî. Dilşadî ji malbata Mîrzayî hemî serhatî zanî. O wî ew hemî bo Çinarê çend caran got. Çinarê navûnîşana mala Serdarî û navên bav û dayika wî ji Hevalî standin û xatirê xwe ji wan xwest.

Roja dîtirê piştî dersan, Çinar çû mala Serdarî. Xwe didît herweçkî diçe mala kesekî pir nêzîkî xwe, mala hezkiriyê xwe. Xwe bi hevala Serdarî ya xwendinê da nasandin û pirsyara wî ji wan kir. Dayikê digel girî, her eynî tiştî got ku he-

X9  
valê Serdarî, Dilşadî gotiye wan, ku Serdar li Zaxoyê hatiye girtin û dibêjin ji ber ku di rêxistineka nihînî de kar fikir, lewma jî hatiye girtin.

Çinarê ji dayika Serdarî xwest ku sebrê bikêşe û bi aneha



Xwedê dê Serdar bi silametî bête mal. Wê Mehemed, bavê Serdarî jî dît. Ew li mal bû. Mit li ser gildkekê rûniştibû, hilim li cigareya xwe ya di baskê ji esmînê çêkirî de didan û berê xwe dida valahiyê. Çinar weha tê gihast ku ew di wê valahiyê de li kurê xwe digere û hesretên bê deng radihêle. Çinarê bo cara yekemîn di jiyê xwe de hest bi hindê kir ku xizmetekê bo kesekî ku pêwîstî bi arîkariyê heyî dike. Cara yekemîn bû di jiyana xwe de hest pê kirî ku ew jî dikare miroveka wecdar be, dikare ji kesine din re, çi nebe bi gotin û hest derbirînê, arîkar be.

Ew cara yekemîn bû ew bi tenha serê xwe û bê pirsyarkirinê ji bavê yan dayika xwe biçe malekê, maleka ne bav û ne dayika wê nas dikin. Dema xatirê xwe ji wan xwestî û ji ba dayik û bavê Serdarî derketî, hest bi hindê kir ku ew ji wê malbata karesat bi serî hatî re hêviyek e, û xwe dît ji wan re, di wê tengasiya wan de arîkar bû û gotina dayika Serdarî ya li ber deriyê "Tu bi Xwedê kî, keça min Çinar, tu werî seredana me, her weçkî min bi dîtina te Serdar dîtî" kar di kûratiya wê de kir û ew ji nav de givaşt û eger ne ji şerman de bûya dê wê bikira girî.

Wê soz da wan ku di demeka nêzîk de bihêt seredana wan. Gelek rehma wê çû dayik û bavê Serdarî. Ne zanî çima, lê got xwe "Dibe ku binasê hindê ew be ku ez hez ji Serdarî dikim, yan jî hema ew bi xwe kesên mirovşîrîn û nermîn in". Di rêyê de bo ciyê otobusê û di otobusê de bo xaniyê xwendekaran, her hizra wê li ser wê pirsê bû. Gotina dayika Serdarî anî bîra xwe ku digot:

- "Kurê min Serdar, gelek ji xwe şermîn e. Qet ji bo me

behsê hevalên xwe yên xwendinê nake. Qet behsê te ne kiriye. Keça min em jî heyî bûn, xwedî erd û pez û çêl û dewar bûn. Bes Xwedê mala bêbextan xerab bike. Dema serhildana çekdar ya rehmetî Barzanî dest pê kirî, kurê şêxê gundê me, Receb, çû digel Barzanî û di gundî de bû berpirsyarê partiyê. Wî gelek kerb ji Mehemedî; bavê Serdarî vedibûn û her şerê wan bû digel wî li ser erdî. Goya bapîrê Serdarî berî mirina xwe bi çend rojan erdê xwe kiribû diyarî bo şêxî û goya şahid jî li ser hindê hene û Mehemed jî li dijî hindê derket û got ku bavê wî pir pîr bûbû û li ber mirinê bû û ne dizanî ka ew çi dike û erd erdê wî ye.

Recebê kurê şêxî derew bi dû Mehemedî ve kirin û gotgotk li ser belav kirin; goya Mehemed komunîst e û goya destê wî digel hikûmetê de ye; bi wan re li dijî Barzanî û Partiyê kar dike. Ê wan gund hemî kir dijminê mala me. Wan weha li me kir ku em bi reva xwe ne gehin û em rep û rût ji gundî derketin û hatin Mûsilê. Piştî em ji wê derê hatin, mala şêxî destê xwe danî ser erd û milkê me, bi bihaneya ku ew erdê wari e û goya em xinizkar in û reviyane nav hikûmetê û mal û samanê me ji wan re helal e. Wan çend niyasek birin û ji xwe re li cem tapoçî kirin şahid û erd xiste ser navê kurê şêxî, Recebî. Xelk dibêjin ku wî li Tapoyê du kaxezk nîşa dane ku yek bi înzeya bavê Mehemedî ye û yek jî bi înzeya Mehemedî bi xwe ye û çi rastiyek jî bo wan kaxezan nîne û her wan bi xwe ew nivîsandine û mor kirine. Niha jî tu dibînî em di çi rezaletê de ne. Me bes xwest ku kurên me Serdar û birayê wî Guhdar xwendina xwe xelas bikin

û bo xwe bibin tiştêk û ji xwe re karekî baş peyda bikin,  
neku hiştî bavê xwe bibin barveguhêz. Niha jî hikûmet kurê  
min digire, goya ew xinizkar e û destê wî digel pêşmergeyan  
e.

Çinarê hizra xwe di wê serhatiyê de kir û rewşa wê malê û  
3i

destkurtî û hejariya ku tê de dijît û rewşa malbava xwe û  
zengîniya bavê xwe û desthilata wî deynan ber êk. Wê çendê  
ew ji nav de arand û pirsyarek di serê wê de xuya bû: "Erê çima  
ev cudahî di navbera mirovan de, bo çi ev hejar û em  
dewlemend in?" Paşî wê got xwe, "yan wekî xelk dibêjin  
Xwedê wisa hez kiriye", û xwest bi wê gotinê xwe ji wî babetê  
aloz xelas bike.

Dema gihaştî odeya xwe ya di xaniyê xwendekaran de,  
Şewnim, ku keçek bû ji Erbilê û di odeyê ve pê re dijiya, di  
odeyê de bû û tiştêk dixwend. Çinarê taqeta silavkirinê jî nebû  
û henîa çanteya xwe ya milî danî rexekî û xwe teraş kire  
ser ciyê xwe. Şewnimê pirsyar jê kir:

- Çinar tu îro kî ve çûbûyî? Te çi ye, îro du rojên te ne, tu  
westiyayî xuya dikî!

Nuke bihêle ez bêhna xwe bidim, Çinarê bersiv da. Min  
hêza çi suhbet û axaftinan nîne, ez dê piçekê bo xwe razim.  
Şewnimê dît ku çêtir e wê bihêle. Çinar ê hest bi xwe kir  
ku nikare hema temaşayî bergê pirtûkekê jî bike. Ew Çinara  
hertim di pola xwe de kesa pêşîn bû û di xwendinê de pir zîrek  
bû, ew du rojên wê bûn, ew û xwendin li hev bûbûn dijmin.  
Ew hêbetî ma ka ew çima hemî tişt pev re hatin û qewimîn,  
zû, li pey hev; Serdarnasîn, evîna ji nişkan ve, girtina

Serdarî, hest kirin bi hejarî û dewlemendiya xelkî û cudahiya tehil ya di navbera herdu texan de. Çawa ew xelkê hejar û destJcirt hind nerm û dilovan û merd û li ser xwe ne û bo çi bavê wê yê zengîn û pêçêbûyî hertim xeyidî û enîgirê ye. Çinarê biryar da daxwazê ji bavê xwe bike ku li dû Serdarî bigere û tiştê jê bizane û hewil bide arîkariya wî bike ku ji zîndanê der bixe. Lê ew dê çawa wê daxwazê ji bavê xwe bike! Bavê wê yê ku di mala xwe de peyva pêşmerge û şoreş û siyasetê qedexe kirî, dê çawa qebûl bike ku keça wî berevaniyê

3Z

ji "xayinekî" bike. Bavê wê, her piştî şikestina serhildana Barzanî ya çekdar li 1975ê, dev ji siyasetê berda. Ew berî hîngê berpirsyarê betalyoneka pêşmergeyan bû digel Partiyê û Barzanîperêsekî navdar bû. Wî jî, wekî hemiyar, çekê xwe deyna lê ew yekser digel hikûmetê bû dost û xelk dibêjin ku her di wê dema ew tê de parrî bû jî, danûstandinên wî bi hikûmetê re hebûn.

Ew di nav xwe de roj bi roj pêtir ji wî karê bavê xwe ne razî dibû. Wê dizanî ku bavê wê digel parastina leşkerî ya îraqê kar dike û hêzeka wî ya taybetî ya ji çend kurdan pêkhatî heye û ew carûbaran digel leşkerî kiryarine jî li dijî pêşmergeyan dikin. Dayika wê gelek caran digotê "De bila ev kar bes be, ha rojekê tu di kunekê de hatiye kuştin". Lê bavê wê çi caran rû neda dayika wê ku devê xwe bi gotinine ji wî rengî li ber wî vebike û eger wê carekê bistehî jî kiribe, wî yekser li ber devê wê daye: "De ka tu devê xwe bigire. Ev ne karê te ye. Pa em dê bi çi bijîn. Ma qey pere ji esmanan tên xwarê."

Her ji ber kar û peywendiyên bavê wê bi hikûmetê re û rawestiyana wî li dijî serhildayiyên çekdar, hevalên wê jî kêmbûn. Nebes li zankoyê, lê ku ew carna diçû bo nav bazarê, li bajarê xwe Duhokê digihaşt guhên wê hinek behsê wê dikin û dibêjin "Berê xwe bidin keça cehşan". Ew bi wê navkirinê pir diêşiya, lê qet çî caran devê xwe jî li ber wan gunehbarkirinan ne vekiribû û herweçkî bi rengê ji rengan bi xwe re qayîl bû ku ew gotinên ji wî rengî rast in. Lewma jî xwe bi hemî ve da xwendinê û bi hindê şiya xwe nêzîkî hinek xwendekaran bike, ew jî bi rêya arîkarîkirinê digel wan di warê xwendinê de û yek ji wan keçan Şewnim bû. Şewnim ku hat zankoyê û wan hevûdu di sinifê de nas kir, roja dîtirê xortekî, ji bajarê Çînarê, behsê bavê Çînarê bo Şewnimê kir û weha Şewnim, ya ku di nav xwe de kurdperwereka mukum bû, xwe ji Çînarê dûr xist. Lê rojekê, berî taqîkirinekê di mate-

33

matîkê de bi çendekê, Şewnimê xwe neçar dît ji bo zelalkirina pîrseka matematîkê, ku li ber bûbû asteng> biçe cem Çînarê, ku di pola wê de di matematîkê de ji yên herî zîrek bû û jê bipirse. Hîngê Çînar û du keçên erebên Mûsilî pev re bûn. Piştî wê arîkariyê, danûstandinên wan herduyan berdewam bûn. Şewnim û Çînar ketin nav behsên kurdan û pîrsa neteweyî û welatê wan û Şewnimê ne dît ku Çînar mîna bavê xwe ye, yê ku behsê wî bo wê hatiye kirin. Çînarê qala siyasetê bi her kesî re ne dikir, yek ji ber ku wê bi xwe hez ji siyasetê ne dikir û ya duyê ji ber ku bawriya wê bi her kesî ne

bû. Lê wê nihîniyên dil û serê xwe bo Şewnimê vekirin. Wê heta ji wê re qala bavê xwe jî kir, ku ya xelik dibêjin rast e û ew bi xwe jî, di nav xwe de, wekî dayika xwe ne digel hindê ye, lê ew bavê wê ye. O gote Şewnimê ku xalekî wê berpirsyarek e di nav pêşmergeyan de û bavê wê nahêle ku ew û dayik û birayê wê biçin seredana wî li deverên li jêr desthilata pêşmergeyan. Wê, li ser bavê xwe got Şewnimê "Ew kî be û çawa be, ew her bavê min e û ez hem wekî keça wî û hem jî wekî jin nikarim li hember van reftarên wî derbikevim û guneh e xelk zarokan jî bi gunehên dayûbavan bisojin". Di navbera wê û Şewnimê de weha xweş û nêzîk bû ku Çinar ji cem herdu hevalên xwe yê mûsilî çû û di odeya Şewnimê de bi cî bû.

Wê hizra xwe di bavê xwe de kir, ka di warê Serdarî de, eger ew daxwazê jê bike, ew dê arîkariya wê bike yan na. Wê dizanî bavê wê dixwaze carûbaran, herna ji bo rûmetê jî be, karine ji wî rengî bike bo ku xelk pê bizanibin û bibêjin "Remezanê Sêvdînî filan kes da berdan". Lê Çinarê dît ya çêtir ew e, ew berî her tiştî digel birayê xwe Behzadî li ser wê pirsê bipeyive. Ew û birayê xwe bêtir nêzîkî yek bûn û wan bo yekûdu, behsê her nihînî û hizr û dîtinên xwe dikirin. Birayê wê xwendina amadeyî xelas kir û xwest beşa literaturê li zan-  
34

koya Bexda bixwîne. Lê bavê wê li dijî hindê derket û birayê wê neçar kir ku biçê serbaziya xwe ya dusalî bike ji bona ku piştî serbaziyê buroya (nivîsîngeha) wî ya xanî û saxtumenavakirinê (miqawiliyê) bi rê ve bibe. Bavê wê ji ber girêdanên

xwe yên parastina leşkerî, ne dişiya hemî wextê xwe li ber wê buroyê be û karûbarên wê bi rê ve bibe. Kur li dijî hindê derket, lê ne şiya hezkirina xwe bi ser ya bavê xwe de zal bike û dayika êxsîr jî ku digel kurî û daxwaza wî bû nikarîbû çî bike û weha bi ya bavê hat kirin.

Birayê wê Behzadî, wekî bo wê diyar kirî, dixwest, hema ji bo ku ji dewrûberê bavê xwe dûr bikeve, biçe Bexdayê û li wê derê bixwîne û weha dê li dûrî desthilata bavê be, û heval û berpirsyarên wî, di wî karê wî yê leşkerî yê parastinê de nabîne.

Behzad jî li dijî wan reftarên bavê xwe bû, lê wî hêj çî caran, li hember bavê xwe ew nerazîbûna xwe bi ziman ne xistibû. Lê ew bê bavê xwe ducara çûbû seredana xalê xwe Xelîlî li deverên li bin kontrola pêşmergeyan û dayikê û Çinarê bi tenê pê zanîbû û kesê ji herduyan ne got bavê. Ya rast ew cara yekemîn ji bo dilê dayika xwe çû bo dîtina wî xalê xwe. Lê piştî ku wî'li wê derê keça xalê xwe Evîn nas kirî, dilê wî ketê û di dilê xwe de xwest ku ew bibe jina wî û ew hezkirina xwe gihand guhên dayika xwe. Herçend bû kêfa dayika wî gelek bi hindê hat, lê wê gotê ku niha, ji ber bavê xwe çî dengî jê neîne. Her ji ber hindê jî wextê Behzad diket dalxeyên Evînê û berê xwe dida bavê xwe, di wan gavan de dilê wî diçû hindê ku bavê xwe bihêle û ji bo manê digel Evînê biçe nav pêşmergeyan, bo nik xalê xwe Xelîlî.

Çinarê biryar da ku roja pêncsembî, dema Behzad têt bo nik wê, bo ku pêk ve biçin Duhokê, ew wê pirsê jê re bibêje û jê re eşkere bike ku ew hez ji Serdarî dike û daxwaza arîkariyê jê bike û jê bipirse ka çî baş e ew bike, ji bo ku tiştê jî Serdarî, ji çarenivîsa wî bizane.

Dilşad, piştî girtina Serdarî, gelek ji xwe tirsîya û gazî Şivanî kir û ew tirsî xwe jê re ber çav kir. Lê Şivan hindî serê derzîkê jî bi kesekî tirsîyayî ne hat berçavên Dilşadî. Bû tehem tehem wî, ji ber guhlêbûna nûçeya girtina Serdarî, lê rengê wî ne hat guhertin û got Dilşadî:

- Hema çî dibe bila bibe, ma em dê çî bikin û çî ji me têt ku em bikin! Dema me dest bi vî karî kirî me dizanî ku ev jî têt de ye; girtin û kuştin.

Dilşadî axaftinên Serdarî li ser Şivanî û aliyên wî yên lawaz; yê vexwarinê û keçan anîn bîra xwe û di navbera nal û bizmaran de ma; aya Şivan dikare weha lê bihêt ku hevalên xwe bide girtin û eger ev rast be pa çima wî navê Dilşadî jî ne daye wan. Yan jî leyîstik hêj timam ne bûye û wekî dibêjin ya tîr di binê de ye.

Şivanî qet xwe bi ser wan gumanjêbirinên Dilşadî ve ne bir, heta piştî ku Dilşadî jê re gotî ku Serdarî tirs ji wî û wan lawaziyên wî hebû. Ya Şivanî di bersiva xwe de li ser wê gotî ew bû; ku, "Serdar bi xeyalan dijît û ma kengî wî hez dikir di xebata siyasî ya nihînî de berdewam bibe û wî li ber bû dev ji vî karê me ber bide. Ew hem ditirse û hem dudil e". Carna jî Dilşadî tirsî hindê dikir ku axaftin ji Şivanî gihastibe Hevalî yê ku digel "Yekîtiya Nîştîmanî ya Xwendekaran" ya ser bi be'isiyan ve kar dikir û neku wî tiştêkî weha kiribe. Lê Hevalî bo wan bi devê xwe diyar kiribû ku ew bes bi nav û bo ku xwe ji sergêjî û destdirêjkariyên be'isiyan biparêze çûye digel wan û wî, heta nuke ka berpirsyarên wê yekîtiyê çî qala xwendekarên kurd yên di zankoyê de ne û ne



digel wê ne, kiriye, ew hatiye, yan ji wî re, yan ji Serdarî re behis kiriye:

- Bona ku haya me ji me hebe. Lê aya dibe ku wî bes xwestiye ku me bike ciyê baweriya xwe û paşî axaftinan ji me derbixe û bigehîne be'isiyan? Dilşadî got xwe.

Sîtava Dilşadî jî li ber wî bi xwe bû neyar û xwe dît yê bi tenê ye. Wî, di wê girupa xwe ya biçûk de dest bi hizra xebata nihînî kir û wî ji Serdarî xwest ku peywendiyê çêbike û Serdar bû navgînê di navbera wan û yên birêveber de li Zaxoyê. Niha ew û Şivan bi tenê man û nizane ka navên wan jî di lîsteya girtiyan de ne, yan na û aya ew hema weha bimîne li benda ka dê çi rûbide yan jî gava xwe biavêje. Lê di dûmahiya wan gêngaşeyên bê dawî yên di nava wî de, wî dîtina Şivanî pejirand û got xwe "çi dibe bila bibe". Lê hewil da xwe gelek berçav neke û bi şev ne ew û ne Şivan di odeya xwe ya hevbeş de, di xaniyê xwendekaran de ne diman û li cem xwendekarên niyas dinivistin.

Ew şazde roj bûn bi ser girtirîa Serdarî ve derbas bûbûn. Dilşadî dizanî ji yên di komîteya birêveber de li Zaxoyê, ji bilî navgînî ku Serdar bû û berpirsyarî ku Mîrza bû, çi kesê din bi endambûna wan nizane û ew ji Serdarî û Mîrzayî piştrast bû ku heta eger ew di bin êşandin û ejkencedanê de bihên kuştin jî ew dê navên wan eşkere nekin.

Ew du şev bûn ew bo nivistinê diçû cem hevalekî kurd yê êzidî ji Baedrê ku navê wî Xudêda bû. Xudêda jî bi girtina Serdarî pir xemgîn bûbû û wî ji devê Dilşadî ne bîhîstibû ku wî û Serdarî û Şivanê bi hev re xebateka nihînî dikir. Lê ji girtina

Serdarî û nerehetiya Dilşadî û gotinên berî hîngê di zankoyê de li ser têkiliyên wan herduyan û Şivanî, wêneyekî weha di serê wî de durist bû, ku dûr nîne ew rast be û jê re xuya bû ku Dilşad jî ji xwe ditirsiya, lewma jî bi şev di odeya xwe ve ne dinivist û li der ve kêr dihat dîtin. Lewma dema

37

Dilşadî gotiyê:

- Ez dê biçim odeya xwe.

- De bimîne lo, Xudêdayî got. Cî li nik min jî heye û tu dibînî hevalê min yê odeyê yê ereb bi şev namîne, ew bo nivistinê diçe mala mamê xwe yê mûsilî û ew bi xwe ji siyaset û hêve û wêveyê çawa erd û esman ji yekûdu dûr in, weha jê dûre.

- Ez dizanim, lê min jî odeya xwe heye û belkî Şivan jî li wê derê be û ne baş e ez wî bi tenê dihêlim, Dilşadî ev ne ji dil got. Ê min tu jî bi xwe ve westandî.

- Dilşad, ez dê vekirî bêjim te ku ez ditirsim ku tu jî bêye girtin, evca bimîne li nik min êmintir e, Xudêdayî gotê.

Dilşad bi bihîstina wê gotina Xudêdayî veleriziya û bo wî diyar bû ku çî nihînî di wî karê wan de ne mabû û xuya bû yan yekî ji wan hersêyan nûçe belav kiriye, yan jî xeyala xwendekarên kurd weha berfireh û mezin e û wê xeyalê peywendiyên

wan digel hevûdu weha şirove û wêne kirine û axaftin bi ser ve hatine zêde kirin û girtina Serdarî ew xeyalên wan kirine rastî û weha bi ser rastiyê hîlbûne.

Dilşadî çî ne got û xatirê xwe xwest û ber bi odeya xwe ve çû. Derî quta, çî deng ji hundir ne hatin. Ji wî re xuya bû Şivan

ne di hundir de ye. Kilît anî derê û derî pê ve kir. Ket hundir û zû derî li pişt xwe girt. Di odeyê de xwe dît yê bêhinteng. Dema bi şev li cem hevalên din wekî Xudêdayî wan bû, kêm tişt, suhbeta wan û munaqeşeyên cur bi cur û perkanê û domîne û tawle û sitrencê ew ji bîr ve dibir û weha wext derbas dibû. Lê bi tenê, di wê odeyê de, dem li ber wî pir giran dibû û careka din tirsî di hundirê wî de, tirs ji girtinê û ketinê di destên asayîşê û metodên wan yê lêxistinê de ku bi ber guhên wî ketibûn, ser hil dida ve.

Ew hêj ne rûniştî derî hat qutan. Ew derqutan wekî mînekê bû, te digo qey ew ji nişkan ve di bin pêyên wî de peqî û

38  
ew kire hezar perçe. Xwe bê deng kir û ji ciyê xwe ne livî. Careka din dengê qutana deriyê hat ve, vê carê bi hêztir û dirêjtir. Tirsî Dilşadî zêdetir bû û li nik wî çî guman neman ku dê ew polîs yan asayîşa hikûmetê bin û derî li wan vebike çî veneke ew dê her bikevin hundir, evca wan çî kilît ji rêveberiya xaniyê standibin û çî deriyê bişkênin. Lewma hêdî û bi tirs ber bi deriyê ve livî û xwe li hêviya qutaneka din ya dergehê girt. Dengê li deriyê xistinê hat, vê carê digel dengê dibêje:

- Dilşad dergehê veke, ez dizanim tu di jor ve yî.

Vê carê ji bihîstina dengê çirrîseyê serê Dilşadî girt û êdî ne zanî ka ew xewn bû yan rastî bû. Lê bo ku ji xwe pişt rast bibe, pirsyar kir:

- Ew tu kî yî?!

- Ma tu dengê min nas nakî, yê li pişt dergehê got, kuro ez Serdar im.

Êdî çî guman di hindê de li ba Dilşadî neman ku ew Serdar

e li pişt dergehê. Her zû derî vekir û herduka ku hevûdu dît yekser û bê ku peyvan ji devên xwe ber bidin çûn ser û stuyên yekûdu û zû dergeh li pişt xwe girt.

39

Piştî ku Serdar wê rojê hatî girtin, haya wî paşî ji xwe hebû ku yê ava sar bi ser wî de dikin, ji bo ku haya wî ji xwe hebe û piştî ku ew ji dilgirtinê hişyarbûyî, wan ew yekser xist ber pirsyar û lêdan û êşandinê. Piştî sê rojên îşkence û azardaneka mezin, dilê wî girt ve û haya wî ji xwe nema. Serdarî carekê çavên xwe vekirin, dibîne ku Mîrza û hersê hevalên wî yên din li rex û rûyên wî rûniştî ne û yek ji wan ku navê wî Merdan e Quranê li ser wî dixwîne. Ku Mîrzayî dît Serdarî çavên xwe zilkin, destê xwe li ser destê wî şidand û bi kêfeka bê sinor gotê:

- Hezar şukur ji bo Xwedê ku tu sax î, ev du roj in tu bê hiş î û Merdanî Quran jî li ser te xwend.

Paşî Serdarî ji Mîrzayî hemî çîrok zanî. Hevalekî wan yê rêxistina wan ya nihînî bi navê Qadirî li Zaxoyê hebû. Rojekê ku Mîrza û Serdar û hersê hevalên din di civîneka xwe ya nihînî de li Zaxoyê rûniştibûn, Qadir ku kurxalet û hevalê Mîrzayî yê biçûkîniyê bû yekser ket hundirê xaniyê ve û paşî bê dergehqutan ket di wê odeya kombûna wan tê de. Ku Qadir bi jor ket, yên di civîna nihînî de bûn man heyirî û ya ji wan ve Mîrzayî ew bangî civînê kiriye û bi hindê pir di nav xwe de nerehet bûn. Dema Qadir ketiye hundir wî yekser got wan:

- Ez dizanim hûn çî dikin, civîna rêxistina we ya nihînî ye.

Ez dizanim ku hûn car bo car li vir kom dibin. Hey mala we

ava ma kurdînî bes bo we helal e, nê ez jî hez dikim digel we xebatê bikim.

Wê gotina wî ya ji nişkan ve wekî ku volkanek bû û di bin 40

wan hevalan de peqî. Her yekî temajayî yê din kir. Mîrzayî wê gavê xwe li ser Qadirî piçek tirş û tal kir û bo hevalên kombûnê diyar kir ku wî çî caran behsê vê xebatê bo Qadirî ne kiriye. Hemî jî ji hindê pijtrast bûn ku ev çî kesî ji wan ne gotiye wî ku civîna wan heye yan ew xebateka nihînî dikin. Hemiyên di civînê de ji bilî Serdarî, Qadir nas dikir û wan dizanî ew xwêya xwe dike nav hemî giraran û mayê xwe di her tijtî de dike. Wan guman di hindê de nebû ku kurekî dilsax e û wî ew axaftinên xwe ji dilekî safgotin, lê pirsek hebû dibû egera tirsê hemiyên ji hatina wî bo nav rêxistina wan ya nihînî û heta bo zanîna wî ku ew karê siyasî yê nihînî dikin. Wan hevalan, wê rojê, pijtî ku wan ji Qadirî xwestibû ku li derveyî odeyê, li benda wan be heta ku civîn timam dibe û di warê wî de biryarekê distînin, ji Serdarî re behsê hindê kir ku Qadirî sexleteka weha li cem heye ku bihêt girtin, ew xwe li ber yek zillehê bi tenê jî nagire û her tijtê ku dizane dê bibêje û ejkere bike. "Carekê maleka ji Bexadayê qeçaxbûyî hat Zaxoyê û xwestin xwe bigehînin gundekî li ser sinoran û ji wê derê derbasî aliyê Tirkiyê yan îranê bibin. Li Zaxoyê, li geracê, şansa wan weha bû ku taksiya Qadirî di rêzê de bû û wî ew siyar kirin û ji zaravê wan zanî ku ew ne xelkê vê deverê ne û ji wî re diyarbû ku ew ji ciyekî din yê Kurdistana bajûr in. Wî ew, li ser daxwaza wan gihandin gundekî, nêzîkî sinoran û ew ji axaftina wê mala pêkhatî ji

day û bav û yek keç û du kuran weha tê gihast ku ew ji hikûmetê revîne û eger bihêne girtin dê karekî xerab li ser destên hikûmetê bihête serên wan. Pijî ku wî ew gihandin gundî, zivirî ve û dema hatî zalgeha lejkerî ya nêzîkî wî gundî, tirimbêleka parastina lejkerî li wê derê bû. Li zalgehê hat rawestandin

û hat ji tirimbêlê peyar kirin û jê pirsîn:

- Malbateka pênckesî ji Zaxoyê hatiye gundekî ji van gundan, erê gelo tu dizanî ew çûne kîj gundî?

4j

Qadir ku dibêje ez nizamim yekî parastinê lê diheyite û dibêjeyê:

- Kurê makerê, de zû bibêje ka te ew li kî derê dîtine û dibe hema te bi xwe ew gihandibin gundekî.

Qadir bi wan gotinên zilamê parastinê pir ditirse û rengê wî têk diçe û dev lê dialize. Ku weha li wî têt, yên parastinê xwe nêzîkî wî dikin û yek ji wan jeqamekê lê dide û dibêjeyê ji çavên te xuya ye te ew anîne, de zû bibêje!

Qadir jî hema bê yekûdu dibêjeyê ku wî ew anîne û navê wî gundê ku ew gihandineyê jî dibêje wan. Parastin Qadirî digire û zû hêzekê dijînin, dewrûbera gundî digirin û wê malbatê desteser dikin û digirin. Pijî hîngê bi çend rojan Qadirî ber didin û wê malbatê vediguhêzin zîndanekê li Bexdayê û hîngê hat gotin ku herdu kurên wê malbatê hatin xendiqandin û bavê sizaya 15 salan zîndankirin wergirt û jin û keç jî man bê xwedî. Xelkê ku vê çîrokê baj dizane, guneha girtina wê malbatê û ya bi serê wan hatî dixê stuyê Qadirî". Lê di ser hindê re, Qadir di dumahiyê de wekî endam, bo nav rêxistina wan hevalan ya nihînî hat wergirtin. Rêxistinê,

du rê li ber hebûn; kesekî ku bi wan dizane ku karê siyasî yê nihînî dikin divê yan bi wan re be û yan jî nemîne. Hindî pirsra nehêlana kesî bû, wê rêxistinê çî caran ew ne kiribû û hema bi gotin birayareka weha dabû, lê ji wan re zehmet bû tijtekî weha bikin û bi taybetî di warê Qadirî de ku kurxaletê Mîrzayî bû. Lewma biryar hat dan ku Qadir bihêt wergirtin bo nav rêzên rêxistinê lê ne keve di komîteya karger de û mafdanê ku ew bi xwe ji xwe re xetekî çê bike û xetê wî bes bi rêya wî peywendî di rêya Mîrzayî de bi komîteya birêveber hebe.

Lê ji bilî ku wî xetê xwe ji sê kesan û bi wî re dibûn çar kes pêk anî, wî wê rojê komîteya karger jî nas kir û weha wî neh 4X

kes nas kirin.

Mîrzayî bo Serdarî vegêra ku jevekê Qadir diçe narincokê bê agadariya wan, bê agadarkirina komîteya birêveber, diavêje tirimbêleka polîsî û tê de polîsekî û efserekî dikuje û her eynî gavê diçe hotêlekê, nêzîkî ciyê bûyerê, ku xwediyê wê nas dikir. Ji xwediyê hotêlê dipirse:

- Erê haya te ji vê peqînê hebû?
- Erê dîsa, ew çî bû? Xwediyê hotêlê jê dipirse.
- Ew ez bûm, Qadir dibêjeyê, min narincokê avêt tirimbêla polîsekî.

Xwediyê hotêlê bi xwe bi parastinê re kar dikir. Wî qet xwe bi ser hindê ve hay neda û çayek ji Qadirî re anî û çû ber telefonê û ya ji Qadirî bihîstî ji parastinê re got. Du sê deqîqe bi ser ve ne çûn û parastin tijî hotêlê bû û Qadir girtin û pajî çûn mala wî û tê de narincok û poster û belavokên

li dijî hikûmetê li cem wî girtin. Her di eynî saetê de û pijtî lêdaneka sivik, wî, ya kirî ji parastinê re vegêra û navên hersê hevalên xetê xwe digel navên herpênc kesên komîteya birêveber dan wan. Hersê hevalên ku, di xetê wî de jî bûn, axaftin li ser xwe dan û gotin jî ku Qadirî gotiye wan ku komîteya wan ya birêveber ji pênc kesan pêk têt û berpirsyar Mîrza ye û navên herçarên din jî û ji wan navê Serdarî jî gotin. Xuya bû ku Qadirî her tijtê zanîbû ji hevalên xetê xwe jî re gotibû û weha jahid bûn çar bi dev û înzayên xwe ve. Pijtî çend rojan hemî kirin di tirimbêleka taybetî ya pijta wê jifjekirî de û ji bilî jofêrî, du polîsên din yên asayijê dan digel wan û berên wan herneh girtiyan dan Kerkûkê û girtîgeha wê ya navdar bi metodên xwe yên ejkence û êjandinê bo ku berî sizadanê, bi lêdan û zoriyê bêtir axaftinan ji wan çêbikin. Serdarî di pajiya tirimbêlê ya jifjekirî de temajayî rêya tirimbêl diçûyê fikir, dît ku tirimbêl ne çû Duhokê û çû Mû-

43

silê û pajî ji Mûsilê derket û rêya Erbîlê girt û ew weha tê gihajt ku dibe dê bi wê rêyê, wan bibin Kerkûkê û zîndana wê ya bi navê "Sicin el- Şimal" naskirî.

Di rêyê de, hêj ji zalgeha dûmahiyê ya bakûrê bajarê Mûsilê, bi çend metran dût ne ketibûn, dema bala wî ketî ser Mîrzayî bi Merdan û Nacî û Ristemî re dipeyive û her yek ji wan tijtekî dibêje yê din û pajî Nacî xwe nêzîkî wî dike û dibêjeyê eger ku tijtek qewimî, ew bikeve ser zikê xwe û xwe mit bike. Her di eynî gavan de Ristemî xwe bê serûber kir û weha li xwe kir ku miriye û hevalên wî, hemiyar kir gazî goya yek ji wan miriye. Şofêr û herdu polîsên din, di pencerka



pijt serên xwe de wê qerebalix û kunzivîrbûna girtiyan di pijta tirimbêlê ya jifjekirî de dibînin, jofêr tirimbêlê ji rê derdixe û li aliyekî rêyê radiwestîne. Herdu polîs û jofêr jê peyar dibin. Pijtî ku polîs ji girtiyan dipirsin ka wan çi ye û jê dizanin ku yek ji wan bi navê Ristemî dilgirtî bûye yan jî miriye û pijtî wan bi çavên xwe jî dîtî ku yek, nêzîkî dergehî wekî kesekî bê can li ser pijtê ye. Yek ji wan polîsan dergehî vedike bona ku biçê hundir û mêze bike ka bi rastî ew kes miriye yan hema dilê wî boriye û klajînkofa wî polîsî jî di destên wî de ye. Serdar hêj tê ne gihajtibû ka rastiya pirsê çi ye û ya ji wî ve rast e ku Ristem miriye û wî dest bi giriyê jî kir, hem li ser Ristemî û hem jî ka dê çi hêt serê wî û yên pê re girtî. Şofêr û polîsê din nêzîkî tirimbêlê rawestiyan û temajayî hevalê xwe dikir û tivengên wan jî arasteyî girtiyên di tirimbêlê de kirî bûn.

Hêj bi duristî polîsê yekê ne gihajtî bo nav tirimbêlê, wî bi serê lûliya tivenga xwe lajê Ristemî livand bo ku bizane ka rast ew miriye yan jî dilê wî girtiye. Di eynî gavê de Ristem ji mirina xwe ya ji qesta zû rabû û hindî hêz di pêyê wî yê rastê de hebû pehînek di bin zîkê wî polîsî da yê ku gihajtibû hindav wî û sivik rabû ser xwe û xwe li tivenga wî da, ew

44

ji destên wî anî derê û zû qontaxa wê bi hêza zend û baskên xwe dawejande navçavên wî polîsê ku ji wê kiryarê mabû jaj. Ristemî bi wî dirbê xwe, ew polîs di dergehê vekirî de pijt û pijt havêt derveyî tirimbêlê bo ser erdî û wî tiveng havêt ber Mîrzayî, yê ku ji wê tivenga ketî di destên wî de zû dest bi teqeyê li wî polîsî û li yên din kirî. Her di eynî gavê

de herdu polîsên din jî dest bi teqeyê kirin. Di encamê de hersê polîs hatin kujtin û herwisa Mîrza û hemî heval ji bilî Serdarî hatin kujtin. Serdarî bawer ji çavên xwe ne kir, wekî kesê dîn û jafbûyî ji bin kelexê Merdanî derket, zû rabû ser xwe. Temajayî wan hemî kelexan kir, hevalên xwe livandin, lê hemî cendekên bê can bûn. Ax axek hat guhên wî, lê zivirî, Nacî bû, zû çû ser kelexê wî û serê wî rakir û kir di koja xwe de. Nacî yê ku hema çavên xwe vekiribûn û xistibûn ser Serdarî bi kutek jiya bibêje Serdarî: "Here, bo xwe bireve, zû bireve" û digel hindê bêdeng, bêcan bû.

Serdar li hember wî dîmenê bi xwîn û kelexên kujtiyan, ku bo cara yekê di jiyê xwe de tijtekî weha sehimdar, ser û kujtin û xwînê dibîne, pir tirsîya û çî di destên wî de nema ku bike ji bilî ku xwe ji wê derê zû rabike û bo xwe bireve hêj çî kes bi ser wî de hilnebûyî. Xwe dît ji wê derê dûrdikeve, dikeve nav wê dejta bêdawî, dibeze û li pijt xwe dizivire, temajayî dewrûberên xwe dike, lê ranewesta. Hertijt li ber wî dibin dehbe û hov, dibin polîs û parastin û asayijên hikûmetê. Di rê de hizra xwe kir ka ew li kî derê ye û zanî ku nêzîkî Mûsilê ye. Wî xwe dît yê dejtê ber dide û xwe nêzîkî wê rêyê dike ya ku berî çendekê tê de derbas bûbûn, lê berûvajî, niha ber bi Mûsilê. Bi rex rêya qîrî ve diçû û çavên wî berî wî diçûn û temaja dikir ka zalgeh li kî derê ye bo ku xwe nêzîkî wê neke. Hindî jê hat ew bezî û haya wî ji westiyan û xwêdanê û jûlmaqîbûna dêm û lajê wî nebû. Nêzîkî girekî bû, hêdî hêdî serket ser girî û li pêjiya xwe nerî, cadeya gijtî

45

dît, tirimbêl dîtî diçûn û tîn, zalgeh jî li pijt wî mabû û ya

ji wî ve zalgeh wekî Izraîlî bi dû wî ve ye. Bajarê Mûsilê jî li pêşiya wî, nêzîkî wî dibû. Hemcara tirsê wenekir ew hest bi westiyana xwe bike û pal bi wî ve rana ku berdewam bibe û xwe zû bigehîne bo nav wan xaniyên ku dîtina wan dilê wî hebekê hîn kirî. Bi bez rêya bo nav bajarî girt û herweçkî dixwest xwe di wan xaniyan wer bike û xanî wî di nav himbêzên xwe de winda bikin. Ne çû mal, ew jî ji tirsê neku hikûmet li wî bigere û hem jî ne xwest belayeka din bo malbata xwe çêbike. Yekser xwe gihande cem Diljadî, lê Diljad di odeya xwe ve nebû. Serdar li der ve, li bin darekê rawestiya û xwe mit kir û li hêviya hatina wî ma. Tarî û jev bi ser de hatin û ew li ciyê xwe ma. Di wan gavan de pir hez ji tariyê kir û hez kir ku jev bi tariya xwe ve bimîne û wî di nav wê rejatiya xwe de vejêre. Ku Diljad hat, ew yekser kete dû wî û weha kete di odeya wî ve.

- De rabe em ji odeya min biçin ciyekî din, neku hikûmet bihêt vê derê jî, Diljadî got.

- Haya çî kesî ji hindê nîne ku me xetê xwe li vê derê heye û hikûmet li ser têkiliyên min û te û Şivanî ne haydar e û ez di derheqê Şivanî de yê xelet bûm, Serdarî got, çî peywendiyeka wî bi girtina me nebû û nîne. Diljad bira, ez niha gelek têhnî û birçî me, de ka tu zû ji kerema xwe re xwarinekê, vexwarinekê bide min.

- Berê xwe bideyê, Diljadî got, ez ha a niha ji nik Xudêdayî tîm û wî birinc û jorbe çêkiribûn û têra te maye. Ya çêtir ew e em biçin bo nik wî, hem da tu xwarinê bixwî û hem jî da ew arîkariya me bike ku te ji Mûsilê bibe bo nav pêjmergeyan.

- Xudêda kurdekî qenc e û ciyê baweriyê û xudan soz e.

Baş e, fermu da em biçin lê çî nebe tu avê bide min, ha ez ji têhna ketim.

46

Wî, her li ser pêyan, av ji Diljadî wergirt û vexwar û derketin. Xudêdayî bawer ji çavên xwe ne kir. Pijî silav li yekûdukirinê û çûna serûstuyên yekûdu. Diljadî bi kurtî nûçeya reva Serdarî ji Xudêdayî re diyar kir û jê xwest ku xwarinê bo Serdarî bîne, ji ber ku ew pir birsî ye. Pijî xwarinê, herçend bû Serdarî jiyana çî tijî nebû û dixwest bes rabikeve ser ciyekî û çavên xwe bigire û bêhna xwe veke, lê di ser hindê re jî wî hêz da xwe û çîroka xwe hemî bo Xudêdayî jî got. Xudêdayî gotê:

- Bira xema nexwe, em kirvên yek in û ez dê te bi rêya çend hevalên êzidî yên ku bes bi nav be'isîn e, bi tirimbêlê gehînim gundê Bozanê, nêzîkî Elkwîjê û ew dê te ji wê derê bi pêyan bibin Duhokê. Lê divê kesek hebe ku te ji Duhokê bibe devera di bin kontrola pêjmergeyan de.

- Bi Xwedê, ez bi xwe çî kesekî li Duhokê nas nakim, Serdarî got.

Diljad jî bê deng ma û wî bi xwe hêj Duhok ne dîtibû. Pajî ji nijkan ve got:

- Erê ma Heval di eslê xwe de ne ji gundekî dewrûberên Duhokê ye?

- Ne Diljad ne, Serdarî got. Hindî Heval e hind yê qontirsinok e, ez xwe bavê wî bim û di vî serûberî de be, ew xwe tûjî karekî wisa nake ku tirs tê de be. Hat û çû bavê wî Duhokî ye, lê ew bi xwe li Mûsilê ji dayik bûye û ew li Duhokê ne jehreza ye.

Pijî bêhnekê Diljad girnijî. Serdarî berê xwe dayê û jê pir-  
A si:

- Te xêr e tu digirnijî, çi qewimî?

- Bira Serdar, Diljadî got, manê me keseka ji te gelek nêzîk  
heye û ew xelka Duhokê bi xwe ye û mala wan li Duhokê  
ye, belkî xêrek di wê de hebe.

Serdar ma heyirî, gelo dê ew kî be. Hindî hizra xwe kir, wî  
47

bes Çinar ji Duhokê, wekî keç nas kiriye, lê ji kî ve Diljad  
Çinarê nas dike û ji kî ve dizane ku ew hez ji wê dike. "Dibe  
ku mebesta Diljadî keseka din be" Serdarî weha fikir kir û ji  
Diljadî pirsî:

- Ew dê kî be weha nêzîkî min e û ji Duhokê ye!

- Berî çend rojan hat pirsyara te ji min kir û pajî navûnîjana  
mala we ji Hevalî stand û her wekî min ji Hevalî zanî ew  
çûye nik dayika te jî, Diljadî ev got.

- Tu rast dibêjî! Ser li Serdarî zivirî. De ka navê wê keça  
xêrê bibêje.

- Çinar, Diljadî got.

Ku Serdarî ev nav bihîst hemî ew serhatiya wî û tirska ka dê  
çi bi serê wî bêt di wan gavan de ji bîra wî çûn. O te digot  
qey Diljadî bi wê nûçeyê dinya hemî pêjkêjî wî kir. "Çinar  
li dû min digere û pirsyara min dike û diçe seredana mala  
me!" Serdarî di nav xwe de ev pirs ji xwe kirin. "Qey ew bi  
rastî hez ji min dike?" Lê Serdarî ev hizir û sersurmanên xwe  
bo Diljadî û Xudêdayî ne gotin.

- Dê ez çawa bijêm wê bibînim? Serdarî pirsyar ji Diljadî  
kir. Lê Xudêdayî temajayî herdu hevalan kir û lêvên xwe miçandin.

Wê guhertina di dêmê Xudêdayî de bala Diljadî kijand  
û ji Xudêdayî pirsî:

- Çi bû Xudêda, tu bi vê pêjnyara min ne rehet bûyî?

- Bira ez nizanim ka hûn wê çawa nas dikin, Xudêdayî  
got, lê piraniya xwendekarên kurd li vê derê behsê wê bi xerabî  
dikin û dibêjin ku bavê wê ji parastina hikûmetê ye.

- Çi, Serdarî bi hêbetbûn ev pirsyare kir. Û her wekî kesekî  
tîreka kujek wejandî dilê wî. Lê Diljadî berî ku Serdar ji  
bihîstina nûçeya Xudêdayî bihête ser hijên xwe got:

- Bira Xudêda, da ez bo te tijtekî bibêjim. Min jî, ji gelek  
kesan guh li van gotinan dibe. Lê ew kes çî caran bi vê keçê  
re ne rûniştine ku bizanin ka ew bi xwe çî kes e û çawa hizir  
48

dike û çî dibêje. Ew kes bes dizanin ka bavê wê kî ye û çî dike.  
Lê wisa nîne û hevala min Şewnim digel wê de, di yek  
odeyê ve dijît û min pirsyara Çinarê ji wê kiriye û ew dibêje  
ku ew keç li dijî kar û kiryarên bavê xwe ye û di malbata wê  
de bes bavê wê weha ye û heta birayê wê jî ji reftarên bavê  
xwe ne razî ye. Evca guneh e mirov keçê jî bixe ber gunehên  
bavê.

Lê ji ber ku ew hemî bo Serdarî di carekê de gelek bûn û  
nikarîbû duristiya pirsê fehim bike, lewma ji Diljadî xwest  
rastiya wê meselê bo wî rohin bike. Diljadî jî bo wî behsê  
bavê Çinarê kir û ka xelk çî dibêjin û got jî:

- Lê Serdar, diyar e ku ev keç ji dil û can hez ji te dike, heke  
kengî çêbûye ku keça kurd rabe pirsyara halê hevalê xwe  
yê kur ji kesine biyanî bo wê bike! Niha pijtî te xwarin xwarî  
rabe serê xwe bijo û binive û ez subehî spêdeyê zû diçim beja

matematîkê û dê wê bibînim û belkî wê bînim vê derê jî bo nik te ku ew hez bike. Subehî pêncjemb e û ew rojên pêncjembê diçe mal li Duhokê.

Roja dîtirê Diljad, spêdeyê zû ji xew rabû û saet hejtê spêdeyê çû ber deriyê beja matematîkê, li benda Çinarê. Nêzîkî saet neh ew dît bi Şewnimê re têt. Silav da wan û pijtî çend peyvan digel Şewnimê gotê ku karekî wî bi Çinarê heye û ya ji Şewnimê ve ew dixwaze, di warê siyasetê de, bi wê re bipeyive lewma gotê:

- Diljad, serê Çinarê bi Marks û Lenîn û Gîvarayê xwe gêj neke..

- Siyaseta çî, Diljadî axaftina wê vebirî, hevlekî wê li nik min e û dixwaze wê bibîne.

Wî pijtî vê gotinê, gazî Çinarê kir, ya ku xwe dabû aliyekî ji bo ku azadiya wan têt nede û guhdariya suhbeta wan herduyan neke. Ku Çinar ber bi wî ve hat, Şewnimê gotê:

- De baje Çinar, em pajî hevûdu dibînin, ez dê biçim der-  
49

sa me nuke dest pê dikg,

Diljadî pirsar Serdarî. (i ya hatiye serê wî ji Çinarê re got, Bihîstina wê nûçeyê b,o. Çinarê dijwar bû. Niha Serdarê wê nebes girtiye, lê ew girriyek g ku reviyê û bi kujtina peyayên parastinê jî tê gunehbar kirin. Ew pirs li ber çavên wê gejek aloz bû.

- Ê niha li kê derç ye? Çinarê pirsyar kir.

- Li nik Xudêdayî ye, Diljadî got.

Çinar nikarîbû wê bawer bike, lê bê hizir kirin got "de ka were em biçin nik wî", Bi r^rê ve Diljadî ew bo got ku wan

li ber e wî bi qeçaxî derbasî Duhokê bikin, lê çî kesekî nasê wan nîne ku wî ji Duhokê derbasî deverên rizgarkirî bike. Çînarê çî ne got, lê yekser di serê wê de pilanek bo derbaskirina wî ji Duhokê çêbû.

50

Dergehê odeyê girtî bû, Diljadî bi destê xwe yê rastê lê xist, dengê Xudêdayî ji hundir hat "Ew kî ye". Diljadî gotê "Ez im, Diljad". Ku Xudêdayî dergeh vekir, Serdar li ser pêyan bû, li hêviya ku Diljad bihêt, neku bes bi nûçeyeka xêrê re bihêt, lê herweha digel Çînarê bihêt. Ku çavên wan herduyan bi hevûdu ketin, bîstkekê, herdu jaj di ciyên xwe de çikilî man. Lê ji nijkan ve ber bi yekûdu çûn û xwe di ser û stuyên hevûdu wer kir. Te digo qey ew herdu mirov bi dehan salan bi hevûdu re jiyabûn û qedereka mezin ew bi xortî jêk dûr xistibûn û ha ew digehin ve yek. Pijî bîsdceka yekûdu himbêzkerinê, haya Çînarê ji wê hebû ku du kesên din jî di odeyê de ne. Ji xwe jerim kir û serê xwe jor kir. Xudêdayî jê xwest ku rûne ser qiryoleyekî ji wan hedruyên di odeyê de. BîstJcekê hemî bê deng man, pajî Çînarê dest pê kir:

- Diljadî hemî serhatiya te ji min re got. Min bi rêve hizra xwe tê de kir. Îro birayê min saet duwazdeyê nîvro dihêt û ez û ew pêk ve dê biçin Duhokê. Ez dibêjim ew dê jêt arîkariya te bike ku tu ji Duhokê derbikevî.

Serdarî bawer ji çav û guhên xwe ne kir ku ew Çînar e û ew dixwaze arîkariya wî bike. Ji nû wî fehim kir ka çîma Xecê bi dû Siyamendî ket, ka çîma Zîna mal û dewlemendî û navdarî hemî ji sexmeratî evîna xwe bo Memê deynan rexe. Îro jî Xeca dilê wî, Zîna vê serdemê ji pêxemetî evîna xwe



ya paqij, ne bes dilê xwe dideyê lê evîndarê xwe ji tengaviyê,  
ji destê neyaran rizgar dike û ew li nik Serdarî mezintirîn  
belge bû li ser evîna wê ya mukum.

Çinarê temajayî saetê dikir û di ber re berê xwe dida Ser-  
5i

darî, çavên wê hezkerin û dilpêveman xuya dikirin. Serdarî  
awirên wê fehim dikirin û dizanî ew çî namyekê digehînin  
navawî.

Diljadî berê xwe da saetê û got:

- Saetek maye ku birayê te bihêt. Ez û Xudêda diçin der  
ve û pajî ku te birayê xwe dît, dê me bi, ka we çî biryar daye  
agadar bikî?

- Bêguman, Çinarê got. Ez dê digel wî axivim û pajî ez û  
ew dê hên nik we, vê derê. Birayê min dê hêt çayxaneyê zankoyê  
û dê li wê derê ero yekûdu  
bibînin.

Xudêda û Diljad derketin der ve. Diljadî dixwest ew û Çinar  
piçekê bi tenê bimînin. Ku ew herdu bi tenê man, Serdar  
rabû derî girt û got "Çêtir e em dergehî bigirin da ku ji  
nijkan ve çî kesê biyanî nêhêt û min bibîne". Çinarê bi erêyê  
serê xwe hejand. Serdarî bala xwe dayê ku pijtî ew bi tenê  
man jermê bi hemî hêza xwe ve, xwe bi ser Çinarê de zal kir.  
Ew çû bi rex wê ve rûnijt. Wî xwe dît yê tirsîyayî û xwêdanê  
eniya wî girt. Destê xwe deyna ser destê wê. Bo cara yekemîn  
hest bi tijtekî, bi hêzeka xerîb kir. Hestpêkirina wê ne  
dûr bû ji ya wî, û wê jî serê xwe rakir û berê navçavên xwe  
da Serdarî, lêvên wan, çavên wan berhingarî yekûdu bûn. O  
bê ku bikaribin tijtekî bikin yan hizra xwe tê de bikin, bê

peyv û axaftin, lêvên wan bezîn bo yekûdu û di ramûsan  
de winda bûn. Ji nû evîna di hundir de hilgirtî bi can û bi ziman  
ket û di sîma û dêmên wan de perçivî û sinorên jermê  
derbas kirin û di yekîtiya can û lajî de ciyê xwe girt.  
ji nijkan ve haya Çinarê ji saetê bû ku çend deqîqeyek bi  
ser duwazdeyê ve derbas bûne.

' Lê xem nake, wê got, birayê min dizane ku dibe ku ez  
çend deqîqeyan dereng biçim. Ew dê li benda min bimîne.  
Berî ji nik Serdarî derbikeve wê gotê:

5\*

- Dergehî bigire û li çi kesî veneke heta ku navê xwe nebêje!

53

8

Birayê wê li çayxaneyê U benda wê bû, ku wî Çinar dît, yekser  
)i ciyê xwe rabû û herduyan destên xwe dirêjî hevûdu kirin  
û silav li hev kirin. Ê paşî Behzadî pirsyar jê kir:

- Erê ka çanteya te ya cilka? Yan te vê carê çi kincên pîs bo  
jûjtinê nînin?

- Belê min hene, lê min xwe hêj lêk ne daye, Çinarê bersiv  
da. Min tijtek heye, ez hez dikim bo te bibêjim.

- De çinar ma ev dema suhbetê ye, Behzadî gotê. Tu dikarî  
suhbeta xwe bo min bi rêyê ve bo mal bikî.

- Ne Behzad, ne, Çinarê got. Ev pirs giring e û divêt ez li  
vê derê bikim.

O wê dest pê kir ji birayê xwe re behsê Serdarî û evîna xwş  
bo wî û serhatiya wî û arîkariya wî pêwîstî pê heyî kir.

Behzadî wekî sergêjekî guhadriya wê dikir. Ew xwîjka wî  
ya weha ji xwe jerimkirî û bêdeng weha zîrek bûye, ji ber

xwe derketiye û nebes hez ji xortekî ji malê re biyanî dike, lê xwe li ser xatirê wî taloqetî metirsiyên mezin jî dike.

- Çinar, kekê, heke bav bi vî tijtî bizane tu dizanî ew dê çi îne serê te? Behzadê jajmayî ev got.

Çinarê qet bi ciddî hizra xwe di wê pirsê de ne kiribû. Evî' na wê bo Serdarî rûhek dabûyê ku ne di xema çi tijtî de bû. Wê di wê gavê de xwe didît ji her gaveka din bêtir girêdayî Serdarî bû.

- Te hizra xwe kiriye ku ew biçe deverên rizgarkirî dê tu çawa wî bibînî û dê dûmahiya te û wî çi be?

Çinar ji wan pirsyarên birayê xwe ne rehet bû. Ji ber ku ew di demeka pir tengav û aloz de jê dihatin kirin û ne dixweşt

54

çi tijtek, gumanek, hizrek bibe asteng di rêya arîkariya wê de bo Serdarî, lewma gotê:

- Nuke ne dema hindê ye. Tu bibêje min ka tijtek ji te têt ku tu bikî yan hawara xwe bibim cem bavê?

- Tu dînî van tijtan bo bavê bibêjî! Behzadî gotê.

Behzadî li xwîjka xwe meyizand û hizra xwe di pergala wê de kir. Dilê wî gelek pê ve ma û ne viya wê bi tenê di wê tengasiyê de bihêle. Pijtî bîstkeka bédengiyê Behzadî got:

- Baj e, ez bi xwe dê wî derbas bikim. Li Duhokê çend xort hene ez pijtrast im ku ev kare bi wan çê dibe û ew daxwaza min li erdî naxin, lê tu rabe min niha bibe cem wî berdilkê xwe.

Kêfa Çinarê pir bi wê biryara birayê wê hat û bi destê xwe yê rastê tepeka kêfê li milê wî da û rabûn û ber bi xaniyê ku odeya Xudêdayê tê de bû çûn.

Ku saet bû duwazde û nîv, Xudêda û DUjad zivirîn, hatin bo odeyê da ku bizanin ka Çinarê çi kiriye û ka ew pêk ve ji bo Serdarî çi bikin. Xudêdayî hez dikir her di eynî jevê de peywendiyê bi wan niyasên xwe yên êzidî bike, bo ku ew, Serdarî bibin gundê Bozanê, bi rex bajarkê Elkwîjê ve, lê dixwest berî hindê bizane ka Çinarê kesek peyda kiriye ku li Duhokê, li benda wî be û wî ji wê derê bergveyî bajarî, bo nav deverên li bin desthilata pêjmergeyan de ne bike. Berî bigehin xaniyê xwendekaran, bi çend metrekan rasthevî Çinarê û biaryê wê bûn. Piştî silav û nasandina Çinarê bo birayê xwe û hevalên Serdarî, wan piçekê Ji ber dergehî pirs munaqeje kir û biryar dan ku Xudêda karê xwe bike û bi arîkariya niyasên xwe Serdarî bi jev bihin | re gundê Bozanê û ji wê derê derbasî Duhokê bikin û dê li gundê Êtwîtê, pişt .Duhokê, Behzad û ew hevalên ku dî ew peyda bike li benda wî bin bo ku pajî ew, wî ji wê derê derbixin û bibin bo deverên derveyî kontrola hikûmetê. Piştî wê biryara wan her

55

pênc ketin hundirê xaniyî û Xudêdayî li deriyê odeya xwe xist û got:

- Serdar, ev em in, dergehî veke.

Lê ne çi deng ji hundir hatin û ne dergeh hat vekirin. Ku Xudêdayî xwest bi kilîtê dergehî vebike, temaja dikeyê ku vekirî ye. Dikevin hundir, çi kesek di jor ve nîne. Hemî man heyirî û her yekî temajayî yê din kir û Çinarê got:

- Ev çi ye? Çi qewimiye? Ka Serdar?

Yekî ji der ve serê xwe hêdî ana hundirê odeyê. Xwendekarekî ereb, xelkê Bexdayê bû. Di odeya bi rex ya Xudêdayî ve

dima û girêdanên wî bi Partiya Komunîst ya Îraqê re hebûn  
û li dijî hikûmetê bû û digot ku dayika wî di eslê xwe de  
kurda bajarê Xaneqînê ye. Wî gazî Xudêdayî kir, lê hersêyên  
din jî ketin pijt Xudêdayî û guhadariya axaftina wî kurî kir.  
- Xudêda ez li ber deriyê odeya xwe bûm, dema hevalê te  
Şivan hatî. Ez dibêjim wî li deriyê xist, dengê ji nav de hat  
bi kurdî tijtek got, wî jî navê xwe got û dergeh hat vekirin û  
ew kete hundir û her di eynî gavê de jej zilam hatin û bi  
debanceyên

xwe yên di destan de bûn ketin hundir û digel Şivanî  
ji odeya te derketin û çûn. Xuya bû ku Şivan di destên  
wan de wekî girtiyan bû.

Hemî jaj man û yekser ketin ve hundirê odeya Xudêdayî  
û xwe çikkênek bi tenê jî, ji çî kesî ji wan ne hat. Diljadî çî  
guman di hindê de neman ku Şivanî ew polîs anîne û weha  
wî Serdar da girtin. Hindî Çinar bû, ew bi yekcarî ji hêz ketibû  
û pê lê sist û xav bûbûn, gewrî ji hesret kijandinê lê hişik  
bûbû. Xudêdayî got:

- Nuke hemî ji dest me derket. Serdar çû. O em jî ketin  
ber. Yan divêt em jî birevin yan jî li benda polîsan bin heta  
tên û me digirin. Ez bi xwe dê li benda polîsan bim û bila  
min bigirin.

Pajî yekser hizra xwe guhert û got:

56

- Ma xwe ez dîn im ku xwe bixim nav lepên van bê dîn û  
îmanan. Ez bi xwe, ha, her ji nuke diçim. Kesekî ji we bivêt  
bila kerem bike digel min, em biçin serên çiya, me divêt û  
nevêt alternatîv tune.

Diljadî berê xwe da Çinara ku di nav çiyayên xem û di nav deryaya rondikan de werbûbû û paji çavên xwe veguhastin bo ser birayê wê û got:

- Kekê Behzad, ez dibêjim çi tirs li ser we nîne. Tu ji kerema xwe xwîjka xwe bibe û zû ji vê derê herin hêj polîs ne hatin ve û ez û Xudêda jî neçar in ku rabin û bo xwe birevin. Her zû Behzadî destê xwîjka xwe girt û destmalka xwe dayê bo ku ew rondikên xwe pê vebimale û derketin. Xudêdayî hinek tijtên xwe yên giring zû dane ser hev û kirin di çanteyeka biçûk ya xwe de û digel Diljadî, pêk ve, bi lez derketin û wan biryara xwe da ku xwe bigehînin gundê Bozanê, bo cem niyasên Xudêdayî û ji wê derê biçin nav deverên rizgarkirî.

57

Diyar bû ku gelek tijt di bîsdcekê de tevlihev bûbûn û bûyer zû qewimîn. Pijtî ku Çinar ji nik Serdarî çûyî bi pazde deqîqeyan, dergehê odeya Xudêdayî hat qutan, lê çi keselcî xwe neda nasîn. Ku bo cara sêyê dengê lêxistina deriyî hat, Serdarî pirsyar kir "Tu kî yî?", ku wî dengê Şivanî bihîst, bê yekûdu dergeh lê velcir û herdu çûn ser û stuyên hevûdu. Şivanî gotê ku min ne zaniye tu li vê derê yî û ez hatim bo nik Xudêdayî û dema min guh li dengê te bûyî ku tu dibêjî "Tu kî yî" ez mam heyirî û min bawer ji guhên xwe ne kir. O berî Serdar dest bi vegêrana çîroka xwe bike, jej peya bê derqutan ketin hundirê odeya dervekirî û debanceyên wan di destên wan de bûn. O yekser berî her tijtî yekî ji wan zilaman pirsyar ji Şivanî kir:

- Navê te çi ye?!

- Şivan, wî bersiv da.

Wan peyayan ji hevûdu re gotin:

- Aha ev bi xwe ew e, jikil û nav yek in. Were digel me bo daîreya asayijê, ev çend rojên te ne tu li dewrûberên mala berpirsyarekî partiya Be'is li Mûsilê digerî, em dixwazin bizanin ka çi karê te li wan deran heye.

Lê berî Şivanî bibin û derbikevin, yekî ji wan, xuya bû ku efserê berpirsyar bû, bala wî kete ser Serdarî, berê xwe dayê û jê pirsî:

- Tu kî yî û navê te çi ye?

- Elî, Serdarî hema bê hizir lçirin navê xwe yê rast ne got û navê xwe kir Elî.

- Xelkê kî ve yî? Polîs berdewam bû li ser pirsyarjêkirinê.

58

- Ereb im, ji Şirqatê.

- Rengê te ne yê ereba ye, lê erebiya te ya ereba ye. Wî efserî weha got û pajî pirsyareka din kir.

- Tu vî kurî, destê xwe dirêj kir Şivanî, nas dikî?

- Nexêr, Serdarî got.

Şivan ji bersivên Serdarî ecêbmayî ma, û di Serdarî de hijyarî û bîstehî dît û kêfa wî gelek bi wan bersivan hat, lê deng ji xwe ne anî.

- Pa çawa ew hat odeya te û tu wî nas nakî? Efserî ev pirsyar jî lçir.

- Ev ne odeya min e, ez di odeyeka din, di qatê di bin vî de me û ez hatim vê odeyê bo ku kitêbekê ji xwediyê vê odeyê qer bikim û wî ji min xwestiye ku ez li vê derê bim, ji ber ku ew çûye pirtûkxaneyê pirtûkekê bîne û dê nuke were.

Efserî baj sehkiye navçavên Serdarî û pajî gotê:

- Behsê hatina me bo vê derê û girtina vî kurî bo çî kesekî neke, heke pajî bo te baj nabe.

Serdarî jî serê xwe bi erêkirina gotina efserî digel peyva belê hejand. Efser û polîs derketin û çûn. Serdar pir tirsîya û bawer ne lîcir ku bûyer weha çû serî û êdî ne wêra di odeyê de bimîne û tirsîya, neku ew polîs vebigerin ve û wî jî bigirin û bi girtina wî belayek bihêt serê Xudêda û Diljad û Çînarê, lewma bê hizirkirin twîrkekî naylonî li wir bû, ji xwe re nanek ku li wê derê bû kir tê de û zû xwe ji nav odeyê bir derve û cadeya gijtî ya ber bi Duhokê diçe girt. Pajî, berî bigehe zalgehê, xwe ji rexê cadeya gijtî da aliyê wê yê rastê, ku bi ya wî ew dejt ber bi bajarkê Tilkêfê diçe û ew jî li ser rêyê ye bo Elkwîjê. Wî digel xwe weha deyna ku biçê Elkwîjê û li wê derê pirsyar bike ka kîj rê diçe Duhokê û wê rêyê bigire. Herçend bû wî dizanî ka Duhokê yan Elkwîjê dikeve kîj rûgehê, lê ew li wan deveran û rê û barên wan ne jehreza bû, lê wî got xwe "hat û bat e, xwe ez bêm girtin, ez her li ser des-59

tên van çûyî me. Evca çêtir e ez jansa xwe biceribînim, belkî ez tê de ser bikevim û ne kevim nav lepên van".

Bi rêyê ve digel kabûsê tirsê yê berdewam yê li ser singê wî û yê ku hizir û hestên wî dagîrkeribûn, gelek hizrên din yên cur bi cur ew belavetir dikir. Dayika wî bi wî dêmê xwe yê bêguneh dihat berçavên wî û ka dê ew çawa xwe li ber wê hemiyê bigire. Hizra wî çû ser bavê wî yê ku xwe ji bela û probleman diparast, yê ku herçend bû ji her tijtekî pêtir gund û war û welatê xwe yê çiyayî diviya û hez jê dikir, lê qet jî xwe nêzîkî siyasetê ne dikir û hez ne dikir ku rojekê ji



rojan kurekî wî bikeve nav lebateka wisa. Lê wî digel hindê jî qebûl ne dikir ku kurên wî li dijî xelkê xwe û pêjmergeyan bikevin aliyê hikûmetê. Serdar di hizra bavê xwe de bû, ew di xema dayûbavan û wê serêjiya wî ji wan re durist kirî de bû.

Niha êdî Çinar jî ji dest wî çû û nizane ka li kî dera Duhokê ye û heta eger bizane jî nikare di nav bajarî de bigere û hema dê baj be eger xwe bi silametî bigehîne dewrûberên bajarî û xwe ji wê derê derbas bike deverên ku pêjmerge lê hene. Ji her tijtî ditirsiya, ji hef hefa sa, ji xijjênê neku mar be, ji pêjna neku rejekên hikûmetê bin. Dinya tarî dibû û di nav xwe de hest bi mandîbûn û hilwejiyanê dikir, dixwest xwe biavêje erdî û êdî ji ciyê xwe ne live û çî dibe bila bibe, bes ku ji wê xebat û leбата ku çî derketin jê ne didît rizgar bibe. Hest bi hindê kir ku pêwîstiya wî bi girî heye, ku rûbine û ji hemî hêza xwe bigirî û bi dengekî bilind giriya xwe bike, bellcî rehetir bibe, bellcî guh bo dewrûbera wî çê bibin û li hawara wî bihên.

Taqet nema wî kîskê nanî di destê xwe de hilbigire, nan jê anî derê û piçek xwar. Nanê hijik di gewriya wî de ne çû xwarê û av digel wî nebû ku pê nanî pal bide xwarê. Pir ji xwe xeyidî û kîsik avêt û ji tirsî bi ser de hatina jevê, lez li 60

pêyên xwe lîcir. Wî ne dizanî ka ew rêk dê wî bi duristî ber bi Tilkêfê û pajî Elkwîjê bibe yan na, lê xwe didît bê çareyeka din. Wî yek tijtî dizanî ku bi pêyan rêya bêtir ji rojekê ye û ew dê çawa bi jevê biçê û dê li kî ve bimîne, ew hemî pirsyarbûn di serê wî de û wan, ew ne rehet dikir. Ji nijkan ve,

di ciyê xwe de rawestiya, dema dengek mîna yê traktorekê yan tirimbêlekê hatiyê, li pijt xwe zivirî, dît ku tirimbêlek ber bi wî ve têt. Biryar da ku xwe lê bigire û eger ne lejkerî be, biçe ber rêka wê û ji yên tê de bipirse belkî biçin Tilkêfê yan Elkwîjê û ji wan bixwaze ku wî jî bi xwe re bibin û çî dibe bila bibe. Lê ku lejkerî be xwe nîja nede. Ew li wê dejtê kete ser zikê xwe. Ku tirimbêl nêzîkî wî bû, dît ku landrovereka kevn e û ji reng û serûberê wê zanî ku ne lejkerî ye. Wî dît yek li pijta wê ya serberdayî siyar e. Pê xwe da ser dilê xwe û ji ciyê xwe rabû û ber bi pêjiya tirimbêlê bezî û bi îjaretine ji herdu destên xwe xwest wê rabiwestîne. Heçku yên di tirimbêlê de ew dît, ji ber ku jofêrî berê tirimbêlê ji wî guhert û di ber wî re çû û ranewestiya û wî dît ku ew kesê li pijtê siyar temajayî wî kir û dît jî ku dersoka li ser serê wî wekî ya kurdan girêdayî ye. Hindî li wan kir qêrî û hawar, lê tirimbêl çû û ji wî dûr ket. Ji xwe bê hêvî bû, ket ser çokên xwe û ji westiyan, têhin, bêhêvîbûn, hinavsotina xwe, berda girî, giryeka ter ya cergbirr. Ji nijlcan ve careka din dengê tirimbêlekê hat ve, temajayî pijt xwe kir çî ne dît. Lê ji pêjiya wî ve tirimbêlek hat, eynî landrovera di ber wî re derbas bûbû. Rabû ve ser pêyên xwe û carelca din destên xwe bilind lçirin. Ku dît tirimbêl ber bi wî ve têt, zû bi hiçkê qemseleyê xwe rondikên xwe ji navçavên xwe vemalijtin. Tirimbêl hat û li ber wî rawestiya. Yê li pijtê ku yê rawestiyayî bû û dersoka xwe ya ku di bin guhên xwe re biribû velcir û bi erebî jê pirsî lca dê kî ve biçe. "Ez dê çim Elkwîjê, lê heke hûn ne çin wê derê hema min bigehînin Tilkêfê jî baj e", wî ev got. Ya

bala Serdarî kijandî erebiya wî kesî bû, ne mîna ya ereba bû û ji rengê wî û ji ber wan simbêlên wî yên bor û ber bi erzinkê ve jorbûyî Serdar ji xwe pijt rast bû ku ew kurdekî êzidî ye. Yê li pijtê hat xwarê û çû cem jofêrî. Serdarî xwest bi kurdî biaxive bo ku bizanin ku ew jî kurd e, lê ne gihajt, ji ber ku dergehê aliyê jofêrî vebû û qerebalixek ji yên li pêjîyê rûniştî hat. Serdar di ciyê xwe de lal û jaj ma û ji çavên xwe bawer ne kir dema dîtî ji tirimbêlê Diljad û pajî Xudêda peyar bûn. Girî û kêf li ba wan tev li hev bûn û xwe di yekûdu werkirin.

Xudêdayî çîrok bo wî vegêra û gotê ku ew jî revîne û ber bi gundê Bozanê diçin û hema baj bû ku bi ser wî hilbûn. Û gotê ku jofêr û yê ku li pijta tirimbêlê bû, niyasên wî yên êzidî ne û ew dê wan bibin Bozanê û pajî dê wan ji wê derê bibin bo pijt Duhokê, bo deverên pêjmerge lê.

Diljad çû pijta tirimbêlê û Serdar li cem Xudêdayî û jofêrî rûnişt û tirimbêl ket ve ser rêya xwe. Serdarî pijtî guh li ka çi bi serê wan û Çinarê û birayê wê pijtî wî hatibû, gelek ji xwe jerim lçir ku ew bû egera bela û nerehetiyê bo wan hemiyan û gote Xudêdayî:

Bira hûn xelet di wê serhatiyê de gihajtine. Şivan hat nik te, karelcî wî bi te hebû û ji nijkan ve ez di odeya te de dîtîm. Pijtî wî, çend polîsên sivîl ku li wî digeriyan û bi dû wî ketibûn û wan ew dîtibû dema ketiye hundirê odeya te hatin ew girt. O binasê girtinê jî ne siyasî ye, lê ji ber ku her wekî wan polîsan gotî Şivanî ew e; ku ew çend rojek in Şivan li dewrûberên mala berpirsyarekî partiya Be'is li Mûsilê têt û diçe û ji

ber hindê wî digirin bo ku bizanin ka wî li wê derê çi dikir.  
Ku Xudêdayî ev suhbet ji Serdarî bihîst, destê xwe yê çepê  
hêl li çoka xwe da û got:

- Min gotê weha neke dê bi hindê belayekê îniye serê  
xwe, lê wî guh ne da min.

6x

- Ma wî li wê derê çi dilcir? Serdarî pirsyar lçir.

- Bira ez ji nû di vê serhatiyê gihajtim, Xudêdayî got. Keça  
wî berpirsyarê partiya Be'is li lîseya li hember zankoyê xwendekar  
e û ew çend roj bûn Şivan bi dû wê ketibû û wî ev tijt  
ji min re got û got jî ku dikeve pey wê keçê heta ber deriyê  
mala wê û li wan deran jî têt û diçe belku keç li ser xatirê wî  
derbikeve û ew wê qayil bike ku bi wî re danûstandin û dildariyê  
bike. Min ew haydar kir ku ew ne karelcî durist e ku  
bi dû keçan bikeve û bi taybetî keçên hêj nebalixbûyî û tirs jî  
tê de heye, nemaze ku bavê wê berpirsyarek e di partiya  
desthilatdar  
de. Lê tu dizanî Şivan bo keçan yê çawa ye, koleyê  
lajê mê ye.

Pijtî ku ew gihajtin Elkwîjê, ji wê derê çûn gundê Bozanê  
ku bi tenijta Elkwîjê ve ye û çûn mala wan niyasên Xudêdayî.  
Serdar ji wê bixêrhatin û mêhvandariya wê malê bo wan  
kirî û wan xwarinên wan di wê jevê de ji wan re çêkirîn ma  
heyirî. Te digot qey ew kurê malê ye, ew berdewam li ber  
xizmeta wî û hevalên wî rawestiyabûn. Zû mirovînî di navbera  
wan de duristbû û xwe dît ne yê xerîb ji wan û ziman û  
reftar û jiyana wan. Pijtî bêhinvedanê Xudêdayî dest bi suhbetê  
kin

- Ez bi xwe dê subehî, îniyê vegerim bo ser xwendina xwe û ez nabînim çi tirsek li ser me hebe, Diljad, tu çi dibêjî?

- Ez jî wekî te dibînim û hindî mirovî pê çê bibe di nav xelkê xwe de bimîne û xwendina xwe bidomîne û ne reve baj e. Diljadî jî pesendiya biryara Xudêdayî kir.

- Ya te Serdar pirseka din e, Xudêdayî got. îjev bêhna xwe vede û subehî kurxalê min Sêvo dê digel te hêt heta te dibe Duhokê, ma ne Sêvo?

- Bira, Sêvoyî bersiv da, min hizra xwe di vê hemî serhatiya we û Serdarî de kir û ez dibînim ku ez Serdarî nahêlim li Duhokê bi tenê û bizivirim. Ez li wê derê jî jehrezam e. Em  
63

dê subehî, bet bi êvareka dereng ji vê derê derbikevin û dê bi jev gehin rexê bajarî û ez dê wî yekser berêve jî bikim bo deverên rizgarkirî li pijt Duhokê û dê wî bibim gundekî jî û dê wî teslîmî hinek niyasan jî bikim ku ew wî bigehînin wî ciyê ew dixwaze biçeyê

Diljadî hindî dinyayekê spasiya wî kir. Roja dîtirê pijtî nîvro Xudêdayî û Diljadî xatirê xwe ji Serdarî û malbata ku lê bûn xwest û zivirîn Mûsilê. Êvareka dereng Sêvoyî Serdar da digel xwe û rêya bakûrê Elkwîjê girtin û ber bi Duhokê û ji wê derê bo pijt Duhokê, bo nav pêjmergeyan çûn.

64

10

Axaftin ji Çinarê ne dihat. Li ber tenijta birayê xwe di talcsiyê de rûnijtibû û hizr û xeyalên wê belave bûbûn. Herweçkî wê bi nasîna Serdarî ya kurt xwe niyasî, heçku bi ser jiyan, pêçêbûn û eza xwe ya windabûyî hilbûyî. Serdar di wê dema

kurt de jê re bûbû hêzelca rûhî bo rizgarbûnê ji kabûsê bavê  
û jê re dibû arîkarekî rûhî di wî jerê di hundirê wê de, jerê  
peydakirina xwe di nav wan hemî hevdiş û tarsitan û nezelaliyên  
ku rê nadinê ew wekî mirovekê serê xwe ra bike, welcî  
miroveka azad nava xwe vebike. Wê, ji bilî birayê xwe û  
Şewnimê, ev jilq û jerê di nav xwe de ji bo çî keselcî din ne  
gotibûn. Heta, ew ne gihajt wan jerenîxên di nav xwe de bo  
wî Serdarî jî bibêje, yê ku ji wê re bûbû palderê rûhî yê herî  
hêzdar û mezin û giring.

Wê gelek cara hest bi hindê fikir ku mirovî pêwîsrî bi tijtekî  
di nav xwe de, yan kesekî, yan hêzekê li derveyî xwe heye  
ku baweriyê pê bîne bona ku xwe pê mukum bike û xwe  
bi jiyana biêxe. Wê bîsteh ne fikir kûr li ser hindê rabiweste;  
aya gelo ew ji kartêkrina olî, yan ji lawaziya mirovî yan ji  
kartêkirina aliyekî din dihat!.

Bavê wê çî cara ne diçû di dilê wê de, lê wê ew hesta xwe,  
heta bo birayê xwe Behzadî jî ne gotibû û di xwe re ne didît  
ku wê bo çî kesê din ji bilî xwe bibêje. Xwe didît neçar, ji ber  
ku ew bavê wê bû, mêrê dayika wê bû. Wê xwe bêgav didît  
ku wê hestkirina di nav xwe de li hember wî bavî wekî nihîniya  
xwe ya herdemî hilbigire. Çinar nikarîbû ji bîra xwe bibe  
lca çawa bavê wê li ser dayika wê behirnî fikir, lê dixist, li  
ser erdî radixijand. Çî heddê dayilca wê bû biçê dawetekê û  
65

di govendê de destê zilamekî bigire, ew dê dûmahiya wê bûya.  
Diviyabû dayika wê hemî karên wan û xwe û bavê wan  
yên navmalê, xizmeta mêhvanên bavê wê yên dargiran bikirana.  
Diviya dayika wê biçûya bazarî tijt bikirîna, balav bikirana,

xwarinên xwe çê bikirana. Û-wê ne dîtibû ku bavê wê, rojekê bi tenê jî, bi dayika wê re çûbe mêhvandariyekê, yan geryan û seyran û piyaseyekê, yan li jûna wê tijtekî xwarinê bo malê kirîbe.

Wê dizanî û hemî niyasên wan û dayika wê ya besteziman jî dizanî ku bavê wê ne yek, lê çend yar hebûn û dema xwe ya pijtî xizmeta hikûmetê û karên wê yên çepel bi qumar û leyistinên ji wî rengî ve derbas dilcir yan diçû cem yarên xwe. Pereyên wî gelek hebûn, lê heta dayika wê pereyên lîcîna fîstanekî

bo keça xwe jê çêbikirana, wî çavên wê derdixistin.

Digotê; "Van keça, nebes çî xêr di wan de nîne, lê her wisa mesrefa wan jî gelek e". Rewja Behzadî ji ya xwîjka wî cudatir bû, bavê wê bi xwe pere didan wî. Behzad mêr bû û bavê wê her xwestibû ku kurên wî hebin. Yekemîn Behzad bû û dayilca wê digot ku kêfa wî; bavê wê, bi bûna Behzadî hindî dinyayekê hat. Lê pijtî Behzadî, Çînar hat û bavê wê bi hindê nebes xeyidî ku jina wî keçek bo wî anî, lê ew herweha êdî bi jina xwe jî re raneket, ji tîrsa neku keçek din jê çê bibe. Çînarê di jiyana dayilca xwe de didît lîca jin di wê komelê de çend bîndest e. Ew bi bawer bû ku dayika wê çî cara bi bavê wê re ne tam kiriye xwejiya lajî û xwejiya bi mêrekî re razanê û xwejiya jinûmêrbûnê. Bavê wê jî wekî piraniya mêrên di civaka wê de, li nik wan ya giring ew bû ku ew di razanê de bi jinekê re, wekî mêr rehet bibin û ne di xema rexê din, jinê de bû, ka rehet bûye yan na.

Wê ew rengên hizirkirinên xwe ji nava xwe dernexistin, ditirsiya wan ji keselcî re bibêje. Gelek caran jî xwe ji ber wî

awayê hizirkirinê bi dîn didît û ji xwe ditirsiya, neku guneh  
66

be keçek weha hizra dayûbavên xwe bike û wan bi wî awayî  
di ser û hizrên xwe de wêne bike.

Lê wê dizanî ku birayê wê jî di çeperê wê de ye, ew jî di jerekî  
de ye, lê bi awayê xwe, welcî mêrê ku derî û rê û metod  
û delîve li ber wî zêdetir in.

Ew niqobûbû deryaya hizr û dalxeyên cuda û jêlhayî dema  
birayê wê gotiyê:

- Çinar, ha em gihajtin zalgeha berî bajarî. Ez dizanim ev  
bo te çi bûyereka giran û êjdar e, lê hewil bide ku li mal li te  
diyar nebe û behsê vî tijtî bo çi kesî, kî bibe bila bibe, neke.  
Çinarê yek peyv jî ne got, bi serê xwe gotina wî erê kir. Bavê  
wê wekî piraniya caran ne li mal bû. Bala dayika wê ket  
ser reng û sîmayê keçê, jê pirsî:

- Te çi ye keça min tu weha reng damayî?

- Piçek serê min diêje, Çinarê bersiv da. Ez dibêjim dadê,  
ez dê bo xwe piçek razim. Çinarê taqeta çi tijtî nebû. Ew  
yekser çû di odeya xwe ve û raket ser qiryoleyê xwe û niqobû  
nav xem û hizr û jerenîxa xwe ya navxweyî û ya bi serê  
Serdarî hatî.

Ew razayî, dayika wê hat û rûnijt ber serê wê û destê xwe  
yê rastê bir ser pora wê û pajî bo ser eniya wê. Eniya keça wê  
piçek germ bû. Viya tijtekî bibêje, lê wê dizanî ew tijtê ku  
dê bibêje ne bi dilê keça wê ye. Dayik bû û baj keça xwe nas  
dikir. Herçend bû wê çi tijt ji devê keça xwe, li ser wî babetî,  
guh lê ne bûbû, lê wê ew keç mezin û bi xwedî lçiribû û dizanî  
ka wê çi hest û nest û hezkirin û nehezkirin hene. Lê



dayikê xwe didît neçar ku wî babetî pê re vebike. Ji ber ku bavê Çinarê ferman dabûyê, ku wê nûçeyê bide keçê û qet bavê wê ne xwset guhdariya dayika wê bike ku ew pirs dilcare bimîne bo heta pijtî ku ew xwendina xwe timam dike.

Mêrê wê Remezani milê wê girit û rahejand û gotê:

- Berê xwe bide min Eyjê, ez im, di van pirsan de, di vê

67

malê de biryarê didim û ev tijte yê vebirî ye û êdî axaftin li ser nahêt kirin û xelas.

Dayikê hêz da xwe û bi dengekî nerim got keça xwe:

- Keça min Çinar, baj dibû eger tu rabibûya û te serê xwe bijûjta û karê xwe baj bikira, ji ber ku dê bo me mêhvan hên.

- Mêhvan? Çinarê pirsyar kir. Kî ne mêhvanên me?

- Mamê te Silêman e, Dayika wê got.

- Ma mamê Silêman kesekî biyanî ye ku ez ji ber hatina wî rabim serê xwe bijom û karê xwe baj bikim! Çinarê got dayikê.

- Ne, ne keça min, lê..., axaftin di gewriya dayikê de asê bû û hindî hat xwe, ne jiya gotina xwe timam bike.

Çinarê serê xwe rakir û berê xwe da dayika xwe ya ku rengê dêmê wê lê wergeriya bû û ziman lê alizî bû û gotê:

- Lê çi ûda! Tijtek heye tu li ber min vedijêrî?

Eyjaya dayik hêz da xwe û hêdî li ser xwe got:

- Ew ev jev tîn xazgîniyan û divêt her tijtî îjev vebirrin.

Bi bihîstina wî xeberî dinya li ber wê hate jilqandin û wekî jajan dev bej ma û temajayî dayika xwe ya ji wê xemgîntir lcir.

- Xazgîniyên çi? Çinarê bi xeyidîn û bi dengekî bilind got.  
Şûkirina çi? Hûn dîn bûne, ez çi jûyan nakim, ez dê xwendina  
xwe xelas bilcim û pajî.... O Çinarê berda giriyê.

Pijtî heyameka giriyê Çinarê devê xwe vekir ve û got:

- Çi ye? Bavê min ji min têr bûye, dixwaze min ji mala  
xwe derbiêxe. Divêt ez kur bim bo ku bi kêr wî bihêim. Ez çi  
jûyan nalcim, û bila pismam jî baj bizane ku ez jû bi wî nakim.  
Ma ez dê çawa jû bi birayê xwe bikim. Nê em bi hev  
re, wekî bira mezin bûne. Ez çi mêran nakim, vê baj bizanin.  
Ez ... Çi nema bû bibêje ku "Ez hez ji Serdarî dikim û  
pijtî wî çi jûyan nalcim", lê li wê derê haya wê ji xwe bû û  
68

devê xwe girt û serê xwe xist bin balîfka xwe û xirîqên pê ket  
û berda girî.

Dayilca reben ma heyirî, di navbera keça bextrej û fermana  
bavê de bû, fermana bavê ya ku ew nikarîbû bi çi rengekî  
biguhore.

Behzad li pijt deriyî bû û haya wî ji hemî suhbetê hebû û  
bê ku axaftinek ji devê wî derbikeve yelcser ji mal derket.  
Tijtek di serê wî de çêbû û xwest yekser bi cî bîne. Mala mamê  
wî Silêmanî nêzîkî wan bû, bi pêyan bi deh deqîqeyên  
piyaseyeka li ser xwe ew dikarîbû bigihajtayê. Lê wî pêyên  
xwe bi lez havêtin. Dema gihajtî wê derê pismamê wî jî li  
mal bû. Ji pismamê xwe xwest ku bo bêhnekê digel wî derbikeve  
bo ber dergehî, ji ber ku suhbeteka wî ya giring heye  
û ew dixwaze jê re bibêje.

Li ber dergehê xaniyê mamê xwe piyaseyek digel pismamê  
xwe kir û dest pê lîcir pirsaxwîjka xwe, ku hez ji wî nake û wî

welcî birayê xwe dibîne bo wî got û jê xwest ku dev ji wê ber bide û biçe bavê xwe qayil bike ku îro neçe xazgîniya wê.

- Min jî li destpêkê wekî wê hizir dilcir, pismamî got. Lê digel wextî ez hatim guhertin û ez nuke hez ji wê dikim.

- Kuro tu ne hatiye guhertin, Behzadî got. Lê ev ji roja bûna te û Çinarê, bavê min û bavê te, vê di guhên we herduyan de vedigêrin û dibêjin û ev di nava te de digel derbasbûna wextî çespî, lê Çinar nikarîbû vî tijtî bixe nav xwe. Ew hez ji te nake û nebêje dê ew digel wextî hez ji te bike, ji ber ku wê tu wekî mêr nevêyî û ew dê her weha bimîne.

- Ez nejê çî tijtekî bikim û bavê min bi ya bavê te dike. Bavê te birayê wî yê mezin e. Bavê min ne guhê xwe dide min û ne ji tirsê bavê te dijê lêve bibe. Ji bilî ku xelk hemî dizanin ku em bo yekûdu ne.

- Baj e tu çî yî? Ka gotina te, dîtina te. Nê ev pirs bes girêdayî te ye, ev pajeroja te ye û divê biryar jî ya te be.

69

- Behzad çî xutbeyan bo min nexwîne. Tu jî dizanî ev bi min nabe. Ne ez dijê bavê xwe û bavê te qayil bikim û ne ez dijê bê wan û bê arîkariya wan çî jinan bînim û çî next û mehran bidim.

- Kuro ma ev tu çî dibêjî, ma ev gotinên mirovan in. Ez dibêjim te tu Çinarê bi xortî bilcî jina xwe dê bibe bela serê te. Ez birayê wê me û ez wê nas dikim, tu çî xwejiyekê pê nabînî û tu jiyanê li wê jî dikî dozex.

Lê suhbeta wî digel pismamî bê encam bû. Mamê wî ji ser hewaleyê xaniyî re gazî wan kir:

- De werin, em li ser çûnê ne.

Behzadî kir dilê xwe ku hema li ber mamê xwe devê xwe vebike û ya gotî pismamî bibêje wî û çî dibe bila bibe, lê ji wî re weha xuyabû ku pirs bi hindê dê xerabtir bibe û nemaze pismamî jî dil li ser hindê bû.

- De kuro xwe piçek bi ser û ber bike, mamê wî got kurê xwe.

- Bav, hema hûn her in, ma xwe ez xerîb nîn im, kurî got bavê.

- Min jî weha digot, lê dayika te hez dike ku tu jî bi me re bî, bavê got, û çêtir e ku tu jî bihêyî.

Behzadî xwe li hêviya wan ne girt û derket û bi dilekî jikestî zivirî ve mal û hemî hizra wî li ser xwîjka wî bû û wan hemî belayên bi ser yek ve hatine serê wê û bêgaviya wî li hember wê hemiyê.

Dema ew zivirî mal, bavê wî jî li mal bû. Hemî bêdeng bûn. Çînar ne li wê derê bû û dengê wê ne dihat, ew di odeya xwe ve bû û dergehê odeyê jî girtî bû. Ji wê bêdengiyê û ji wî serûberî, wî zanî ku bavê wî, wê carê jî topizê zoriyê bi kar aniye û keç êjandiye û weha hemî bêdeng kirine.

Silav ne kir bavê xwe û hema rast çû di odeya xwe ve rûnişt ser qiryoleyê xwe, li benda bellcî ji nijkan ve tijtekî weha

70

rûbide ku berê bûyeran pê bihêt guhertin û çareserî li gor dilê Çînarê bihêt. Wî bihîst mam û jinmam û pismam hatin û dengêkî din jî hat. Dengê jinmama wî hat, silav kir. Dengên wan nizim û hêdî bûn. Dengê dayika wî ne dihat. Ji nijkan ve bihîst dayilca wî dest bi axaftinê kir. Dergehê odeya xwe vekir û piçek derket der ve bo ku baj guh lê bibe ka ew dê çî

bibêje.

- Manê hûn birayên yek in û keç û kur yê ne, dayika wî got. Lê keça min nuke dixwîne û ma çi ye heke em vê pirsê bihêlin bo pijtî timamkirina wê bo xwendina xwe? Dengê bavê wî hat, axaft bo ku dayika wî bêdeng bike:

- "Silêman bira ev ne pirsek e em dê rabin nuke li ser biaxivin" bavê wî weha axaft herweçkî dayika wî çi negotî. "Ev Mela jî li vê derê ye", bi vê gotinê Behzadî zanî ku melayek jî bi wan re ye. "Ev mela û bila li gor jerî'etî çê bike û keça min bi xwe nexweje û ne jê ji nav nivînan derbikeve, lewma hema ev ez wekîlê wê me û bila mela li gor jerî'etî Xudê û pêxemberî dest pê bike".

Pijtî hîngê bi du mehan bû bêhinvedana havînê û Çinar hat veguhastin û bû jina pismamî. Wê êdî wisa kerb ji wî pismamî vebûn û nemaze pijtî ku zanî Behzadî wê rojê gotibûyê ku Çinar hez ji te nake û dev jê ber bide û wî guhneda jîreta Behzadî. Ne bi pismamê xwe re raket û ne jî hijt ew xwejiya jin û mêrîniyê bizane û bibîne. Hema bi nav û welcî bi cî anîna fermanekê, xwe dît jina pismamî ye û ne zêdetir. Mamê êdî nehijt ew biçe zankoyê jî, ji ber ku bi dîtina wî, ew êdî jina malê ye û mêrê xwe heye û nabe biçe zankoyê û hefteyê carekê bihêt mal. Divêt ew li mal be û arîkariya jinmama xwe di karûbarên malê de bike.

Xwendina wê jî ji dest wê hate kirin. Man ew û xewn û Serdarê ku ji hîngê were çi agadariyek jê ne gihajtiyê. "Xewnek bû hat û çû? Yan çiya bi çiya nakevin, lê çav bi çavan di-

7i

Kevin?", wê carna weha digot xwe. Di nav xwe de qet hêviya

dîtina Serdarî ne vemirand û her bi wê hêviyê û bi tama ji wê hêviyê û ji wê evîna rûhî digihajtê, ew di nav wî jûyê xwe yê dozexîn de dijiya.

7\*

II

Serdarî bi arîkariya Sêvoyî xwe dît li deverên rizgarkirî, li gundekî bi rex Mangêjkê ve. Pajî ji wê derê bi arîkariya hinek rêvingan çû devera Berwarî Bala. Di wê hemî rêya xwe de ji bilî ku qute quta dilê wî bû ka dê çi hêt serê wî û ka dê li kê derê bi cî bibe, sirûjtê ciwan yê wan çel û çiya û dol û newal û dar û bar û av û kaniyan ew sermest lçiribû. Û te digot qey wî ew hemî cî berî hîngê dîtibûn û wî dizanî ku wî ew ne dîtibûn lê dayûbavên wî hind bo wî qala welatê wî kirine ku wêneyekî sax û durist ji bo wî welatî di serê wî de durist bibe. Li gundê Kanîbelavê, ji ber ku wî berî hîngê bihîstibû ku mizgeft li wan deveran ciyên mana pêjmerge û rêving û mêhvanan in, çû mizgefta gundî. Kesek hat û got ku ew ji Bergiriya Millî ye û hez dike bizane ka ew kê ye û ji kê ve hatiye. Ku wî çîroka xwe û hevalên xwe yê ku hatine kujtin û reva xwe gotî, wî biraderî gotê ku wan guh li pirseka weha bûye ku hinek ji rêxistineka nihînî li Zaxoyê hatine girtin, lê wî pirsra kujtina bûyî ne bihîstiye. Wî xortî gotê ya çêtir ew e ku ew biçê nik komîteya deverê û xwe li cem wan bide nasandin û heke divêt pêjmergetiyê bike yan peywendiya partîniyê çêbike, divêt ew xwe bigehîne wê derê. Wî jî li wî biraderî vegerand û gotê:

Bira ez revîme û hatime vê derê, ku çê bibe, ez hez dikim rûbinim û mayê xwe di çî de nelcim.

- Bira ez jî ne endamê çî partiyan im, wî kesî ku navê wî Rêbaz bû, got. Lê min xwe dît ku baj e ku ez bikevim digel Bergiriya Millî bo ku kêmtîj hest bi hindê bikim ku ez jî bejdar dibim di bervanîkirinê de ji vî gundî û xwe, ev jî lca-73

relcî pêwîst e ku em bikin.

- Baj e, ez jî dikarim xebatê di tijtekî weha wekî Bergiriya Millî de bilcim, wî xwe dît bê xwe weha dibêje.

- Lê bira, te ya rast bivêt, ez bi xwe te nas nakim û nizanim ka tu keselcî li van deran nas dikî yan na û heke ne, ya çêtir ew e tu biçî cem komîteya birêveber ya deverê û ew dê bêjin te ka çî bajtir e tu bikî.

Serdar ma heyirî, "De were niha ez ji hikûmetê revîme û ev jî bela xwe ji min venakin", weha got xwe. Pajî hizra xwe di meselê de kir û got xwe, "Ê dîsa ma ew ji kî ve dizanin ez çî tovek im, divêt ew li ser min bikölin û bizanin ku ez ne yê xerabiyê me û ne ji aliyê hikûmetê ve hatime hinartin bo destdirêjkarîkirinan bo ser wan", iewma got Rêbazî:

- Baj e bira, ez hez dikim eger çê bibe hûn îro xwarinekê bidin min û ez li mizgeftê binivim û subehî ez diçim komîteya deverê.

- De rabe fermû em biçin mala me û em jîvekê pev re bixwin, Rêbazî gotê.

Jinekê bi eniyeka girê bi xêr hatin li wî lçir û ji Serdarî re diyar bû ku ew jina Rêbazî bû, ji ber ku wê gazî Rêbazî kir û pit pitek bi serê wî anî û dengê wê hat Serdarî dibêje Rêbazî: "Hey maltirnêsnek, me bi xwe çî nîne ku em bixwin û tu her jev mêhvanan digel xwe tînî. Ez nuke hetka te bibim û

bêjimê me çi xwarin nîne...!" Dengê Rêbazî hat dibêjeyê:  
"Keçê dengê xwe nizim ke, hemî nanak e. De ka tu wê savar  
û jorbeya ji ber firavînê mayî bîne heta subehî jî Xudê kerîm  
e". Serdarî hind ji xwe jerim kir û xwest rabe û derbikeve lê  
nejîya wê jî bike.

Di wê gavê de dengê kesekî hat dibêje:

- Rêbaz, heçku mêhvanekî te heye?

- Belê Silo, de fermu were nik me, Rêbazî gotê.

Rêbaz bi zebelehekî zilaman re, peyayekî bejin bilind û zi-  
74

rav û simbêl qalind û dêm spî û çav jîn bi jor dikeve:

- Ev Serdar e, ji nû hatiye silal, Rêbaz dibêje Siloyî. Ev jî

Siloyê nalbend e, Rêbaz Siloyî bi Serdarî dide nasandin.

Pijtî ku rûdinin, Silo bi çavên xwe baj temajayî Serdarî dike  
her welcî ew duktorek e û berî destnîjankirina nexwejiyê  
berê xwe dide nexwejê xwe û pajî got:

- Baj e mamu pa heke ev xelke hemî ji bajaran fîlar bû û  
reviya pa dê lîcî di bajaran de bimîne.

- Ew di rêxistina partiyê di bajarî de bû û hevalên wî hatin  
girtin û kujtin û ew ji destên wan verestiye û hatiye vê derê,  
Rêbazî li jûna Serdarî berisva Siloyî da.

- Aha, elhemdulîlah tu bi saxî ji destên wan kafiran derketî,  
Siloyî got û dom da axaftina xwe. Diyar e tu mirovekî  
xwende yî. O berî ku xwe li bersiva Serdarî bigire beredewam  
bû. Lê mirovên xwende nazik û bi naz in. Hindî hatine,  
wan xwe li van deran ne girtine. Wan taqeta me û jiyana  
me nîne. Yan derketine derveyî welatî yan jî bi kar û jolên  
rehet ve mijûl in. Wî bînamûsê bavê min bi xwe li ber destên



melayê gundî xwendibû, lê ez ne hinartim ne bo ber destên  
melayan û ne jî bo dibistanê. Heke niha min jî belavokên  
partiyê xwendiban. Ez bi rê kirim bo ber kehirkan û pajî  
pezî û pajî garan. Heke rojekê te hespek hebe bîne nik  
min ez dê jê re nalên baj çêbikim. Siloyî hemî gotina xwe  
arasteyî Serdarî dikir. Tu li vî gundê me çî bixwazî heye; nalbendê  
wekî min, asinger, mamoste, siyasetmedar, mela, qeje,  
duktor, endazyar, helbestvan, dengbêj, her çî nifjê mirovan  
bixwazî hene. Her çî partiya tu li Kurdistanê bixwazî li  
gundê me heye. Tu dizanî xelik ji nav hikûmetê direvin û  
tên vê derê. Diyar e ku ew ji ber xwejiya gundê me tên vê  
derê. Eger te, dema tu htiye gundê me, baj temaja kiribe,  
gundê me gelek bilinde, li serê çiyayê Metîna ye û dibe ku  
eger kurd rojekê biçin bo ser banê heyvê ew dê ji gundê me  
75

çin, ji ber ku gundê me hind bilind e, hema nêzîlcî heyvê ye.  
Siloyî bê vebirîn axaftina xwe dikir û rê ne da çî kesî ku  
peyvîna wî vebibire. Serdar, pijtî jîvxwarinê, vegeriya mizgeftê.  
Rêbazî dojekek û betaniyek jî bo wî anîn mizgeftê.  
Wê gavê bûbû jev û ji ber ku mizgeft ji mêhvanan pir bûbû,  
bi zorî ciyê wî hat kirin. Li wê derê hêzeka pêjmergeyan bûbû  
mêhvan, dê wê jevê bimana û roja dîtirê, spêdeyê zû, biçûna  
ciyê komîteya deverê lê dima. Ew jev li ber Serdarî pir  
giran û dijwar bû. Herçend bû wî li ser rewja deverê gelek  
suhbet bihîstibûn, lê wî dizanî ferq e ku mirovî guh li tijtekî  
bibe û wî tijtî bi xwe, bi çavên xwe bibîne, û ji wî re xuya bû  
ku kartêkrinên herduyan; bihîstin û dîtîne li ser hestên mirovî  
jêk cuda ne.

Her çend bû halê mala wan ne yê baj bû, lê wî çî caran bertengiyeka mîna wê di dema nivistinê de ne dîtibû. Wî, hema bi kutekî lcarîbû xwe ji ser tenijtekê biqulipîne bo ser tenijteka din. Li ser pijtê yan li ser zikî cî ne dibû, ji ber ku cî bi ciyî ve bû. Li ser tenijte jî nivistin bo wî zehmet bû; piraniya jevê li ser tenijta çepê derbas kir û destê wî jil bû. Yê ku li aliyê wî yê çepê nivistî berê navçavên xwe dabûyê, lê yê destê rastê pijta xwe dabûyê û ew zilam ji wî pir nêzîk bû; evca gelek ji xwe jerim kir ku berê navçavên xwe di nêzîkiyeka wilo de bide pijta wî. Ji bilî wê, bêhna cigare û gore û tir û fisan ew bêhin teng lçir. Wî dixwest her çî zûtir bibe spêde û ji wê mizgeftê derbikeve. Ew berî hemiyar ji xew rabû û derlçet derve. Çû bo nav bîstanekî nêzîk, mîst û rît û xwe bi çend beran paqij kir. Pajî çavên wî bi kanîlca gundî ketin, çû ser kanîkê, av jê li navçavên xwe kir. Temaja lçir ku hinek peya li rêzekê rawestiyayî ne, destên hinan di jelên wan de ne, diyar bû tijtikên xwe bi destên xwe girtibûn. Wî zanî ku wan mîstine û ew weha wan tijtikên xwe bi destên xwe digirin, bo ku jelên wan bi mîzê pîs nebin, heta ku dijon. Hinek

76

jî berên biçûk bi destekî digirin û pê tijtikên xwe ji mîzê zuha dikan, heta gera wan û kanîkê û jûjtinê dihêt. Ev hemî ji bona ku bê nivêj nebin. Li ser wê kaniya mezin ya avê hinan pêyên xwe û hinan çavên xwe û hinên din jî tijtikên xwe dijûjtin. Ku Serdar zivirî ve mizgeftê pêjmerge ji xewê rabûbûn û berpêkên xwe girê didan. Wan pêlav kirin di pêyên xwe, tivengên xwe li milên xwe kirin û hinan nivînk dan ser milên xwe û birin ve bo wan malên wan bi jev jîv lê xwaribû û nivînk

ji cem wan bo nvistinê anîbûn. Lê wî ne birin, ji ber ku Rêbazî gotibûyê ku bila nivînk bimînin li mizgeftê, ew dê pajî hêt û wan bibe. O Serdar jî bi wan re kete rêyê bo komîteya deverê.

Di rêyê de pêjmerge li gundê Bêlîzanê rawestiyan û yelcî, ku bi rex Serdarî ve diçû gotê:

- Em dê saetekê bêhna xwe vekin û pajî dê berdewam bin ve li ser rêya xwe. Tu dilcarî bi min re bihêy malekê, yan jî ev mizgeft e û wa hanê jî av e û tu dikarî li vê derê bî, li benda me heta em li vir amade dibin.

- Gelek baj e, Serdarî got, ez dê li vê derê li hêviya we bim.

Serdar çû ber sirka avê û avek li çavên xwe lîcir û hin jî vexwar û pajî çû ber siha dara ku li ber tenijta mizgeftê bû û xwest bêhna xwe li bin wê darê bide.

Lê wî di wê gavê de dît ku zarokên gundî bi bez ber bi pijt mizgeftê ve diçin. Wî mereq kir ka ew çi bûye û bi taybetî pijtî ku dîtî ku hinek xort û kal jî ber bi eynî ciyê diçin.

Ew jî dide dû wan û li pijt mizgeftê dibîne ku zarok û xort û kalên gundî li kesekî xirve bûne. Ew jî diçe ser kevirekî bilind û temaja dike ku zilamekî bejin bilind, cildirhayî, pêxwas, rihberdayî, û ji navçavan wekî kesekî giran û giravî diyar li nîva wê jemate û qerebalixê rûnijtiye. Ku wî peyayî

77

destê xwe yê rastê bir bo bin guhê xwe yê rastê hemî bê deng bûn û dengê wî zîlamî bi vê stiranê bilind bû:

"Careka din baran, berf,  
serma û seqem dibare,

xwe li ser rêbaran radiêxe,  
û kolanên gundê te li bin rijdiya baranê,  
li bin hatin û çûna pêyên we gundiyan û dewarên we  
dibin herî,  
dibin mîna herkêlê,  
û hêj Salo,  
xwediye dilê pak,  
yê ku rojekê bi tenê jî,  
gavekê bi tenê jî  
ne xeyidî,  
eniya xwe girê û mon ne kirî,  
yê ku bijkurîn ji ser lêvên xwe ne havêtî,  
ew, Salo, bi Icincên xwe yê tenik,  
bi Icirasê xwe yê ne qupçekirî,  
bi pêyên xwe yê tazî û bê pêlav  
li ber sermayê ye û digirniye,  
li ber baranê ye û dibêhnije.  
Salo, dêmê bi lêvkenîn, destê xwe bi silavê li zarokekê, ku  
li milê dayika xwe ye, dilivîne.  
Salo çi kesî bê silav û girnijîn derbas nake û  
xwe li benda bersivên silavan, girnijînan nagire.  
Ajka Saloyê enîvebîji birsan qirç e qirç e,  
Salo mereqdarê nanekî ye.  
Salo li gundê xwe pir diljad e  
û hêj banên gundiyan ji axê ne  
û hêj pêgurdan li hawara dilopan diçin,  
zivistan dijwar e.

Pîrejinek pêgurdanî li ser banê ku bûye herî û qur dikêje,  
nikare,  
pêgurdan ji destên wê vedirese,  
ji ser banî vedizele, bi erdî dikeve.  
Salo tu wê dibînî,  
dilê te yê mezin, te, yê xort, ji ciyî dilivîne.  
Tu pêgurdanî li ser milê xwe yê çepê dibî serbanî,  
çavên pîrejinê yên westiyayî ji kêfan de rondikan berdidin,  
te gij qulaç û kujî,  
tev qul girtin,  
te serban hulî kir,  
ji nava odeyê dilop bin bir lçirin.  
Destên te û gundiyan req dibin,  
jeq jeq dibin,  
dilên we li jûna destên we yên avlekî  
bilindî esmanan dibin,  
bilindî Xudê dibin,  
rehmê dixwazin,  
piçek nanî û germê dixwazin.  
Wî dengbêjî bi stirana xwe, bi dengê xwe yê xwej û dilgir, bi  
naveroka wê stiranê Serdar xistibû bin kartêkirina xwe. Stiranê  
behsê Saloyekî û birayê wî û ka çawa ew birayê wî hat  
kujtin fikir. Wê behsê gundekî dilcir û ka çawa kwîxweyê  
(muxtarê) wî gundî ket pêjiya lejkerê dagîrkeran û ew anîn  
gundê xwe û bû egera jinavbirina gundî. Dema sriran bi dawî  
hatî Serdarî dît ku guhdarên wê bi xerribar û guhijî dixuyin.  
Di wê gavê de pêjmerge li wir xirve bûn. Ew pêjmergeyê  
ku gotibû Serdarî ku li wir li benda wan bimîne berê xwe

dayê û got:

- Pismam wextê çûnê ye.

Serdar jî bi wan re dide rê û ew zilamê ku stiran digot û

79

peyv û naveroka stirana wî di hij û mejiyê wî de dixulxulin.

- Navê wî Salo ye, ew pêjmergeyê bi rex wî ve dibêjeyê.

Ew her roj li gundekî ye û her ciyê ku diçeyê jî vê srirana

xwe bi xwe û birayê xwe dibêje.

- Dengê wî gelek xwe jî xemgîn e, Serdarî got.

- Gundî gelek hez ji dengê wî dikin, wî pêjmergeyî got. Ji

mala wan bes ew bi tenê maye. Birayê wî berî çend salan hat

kujtin. Birayê wî pêjmerge bû digel hêzeka din ya kurdî.

Rojekê bi xwevedizîn hat seredana birayê xwe Saloyî. Wan

gelek yekûdu diviya û ew gelek ji Saloyî xerîb bûbû. Salo jî

pêjmerge bû digel partiya li dijî partiya wî. O kesê pê ne zanî

ku birayê wî li cem wî ye. Wî xwest sê rojan li cem Saloyî bimîne

û pajî biçê devera jê hatî. Manê partiyên me welatê me

li ser xwe dabejkiriye û ji xwe re sinor jî destnîjan kirine. Cîranekî

Saloyî pê dizane û partiya li deverê desthilatdar pê dihesîne.

Berê spêdeyê bû, Salo her roj wî wextî ji xew radibî û diçû

ser rûbarî bo destavê. Wê berê spêdeyê Salo li ber rûbarî bû

dest ava xwe digirt û birayê wî di xaniyê ve nivistî bû û ew

her nivistî, di nivînan de hat kujtin. Du sacor berdabûn lajê

wî. Saloyî li ber rûbarî dengê gulleyan bihîst û dilê wî xwe

hilavêt û tirsê ew girt. Ew yelcser, bi bez ji ser rûbarî ber bi

mal hat. O birayê xwe di wî halê bê hal de dibîne û dinya li

ber çavên wî tarî dibe. Ew dikeve ber kelexê birayî û dike girî

û pê dibêje û wî himbêz dike û dide ber maçan û dibêjin ku

ji ber gelek maçîkirina wî bo birayî xwîna birayî çû nav devê  
wî û bo hundirê wî û dibêjin ji ber hindê jî ew her eynî rojê  
sewdaser û dîn dibe.

- Birayo bawer neke Salo mirovekî dîn be, pêjmergeykî  
din ku li pêjiya Serdarî bû got. Yên dîn em in. Were temaj  
bike mirov bo çî dibe pêjmerge û li ser destên kê winda dibe!

80

Pajî hemî bê deng bûn û Serdar nejiya wî zilamî ji hizra  
xwe derbixe û stirana wî dergeh di nava wî de, î ber dinyayeka  
hizran vekirin.

81

IX

Li komîteya deverê, pijtî gotûbêjeka dirêj, endamekî komîteyê  
ku xwe bi berpirsyarê rêxistinê dayî nasandin gotê ku  
haya wan ji wan û karê wan yê nihînî di bajarî de hebû û ew  
dizane ku pirseka weha rûdaye û hevalên wan hatine kujtin,  
lê wan ne zanîbû ku yek jê xelas bûye. Wî berpirsyarî kêficwejiya  
xwe pê anî û jê xwest ku bimîne li komîteya deverê,  
wekî pêjmergeyekî karekî bike heta demelca wêvetir.  
Pêjmergînî û tivenghilgirtin ne di serê Serdarî de bûn. Wî  
dixwest eger ku tijtekî jî bike, bi lcarekî weha rabibe ku  
peywendîdar  
be bi xwendin û rewjenbîrî û tijtên wilo. Ku wî  
ew dîtina xwe got wî berpirsyarî, yê berpirsyar navçavên xwe  
lê mon lçirin û gotê:

Baje pa tu çîma ketiye nav rêxistineka me ya nihînî, ma  
qey ne daxwaza te ew bû, tu xebatê di rêzên partiya me de

bilcî? Panê xebata me her ev e. Lê bo te çêtir e ku tu bibî pêjmerge,  
ji ber ku dê te ciyek hebe ku tu lê binivî, dê te xwarina xwe hebe û dê hêyî û biçî deverê û dê xelkê nas bikî.  
Li destpêkê Serdarî xwest bibêje ma pêjmerge bi karên rewjenbîrî û rewjenkirinê mijûlnabin lê ew gotina xwe dernexist.  
Wî hizreka zû di wê axaftin û pêjniyara wî berpirsyarî de kir û xwe bêgav dît; ne niyasekî wî heye ku li mala wî bimîne, li cem wî binive û bixwe, ne pere û xanî û erd û karekî wî heye, lewma biryardana xwe paj ne xist, lê her di eynî rûniştinê de got wî berpirsyarî "baj e". Berpirsyarî jî gazî pêjmergeyekî kir ku li ber deriyê odeya wî ya di binê çiyayê Metîna de avakirî bû û jê xwest ku gazî Rizgarî bike.

8z

Pijî bîstkekê peyayekî jiyê wî nêzîlcî çil salan bi jor ket û silav lcir. Berpirsyarî da nasîn û got wî kesî ku "ev hevaleyê me yê fîlarbûyî ye û bila digel we kar bike heta em berê xwe bidinê lca pajî çi lcarekî bidinê"

Wî zilamî destê xwe dirêj lcir destê Serdarî û got: "Ez Cemîl im berpirsyarê Yekîtiya Lawan". Ew jî pêj ve rabû û destê wî girt û silava wî lê vegehand. Lê Serdar ji bihîstina hindê ku ew yê nelaw berpirsyarê yekîtiya lawan û xortan e guhijî û ecêbmayî ma .

Wî digel Yekîtiya Lawan bo dema çar mehan kar lcir û pajî ew hat hinartin digel mefrezeyekê bo çend êrijan, wê jî pênc mehan vekêja, tê de zirav li wî ji tirsan qetiyên û jerim dikir wê bo çi kesî jî bibêje. Wî zanî ku heke mirov bitirse jî divêt tirsana xwe bi hîç renekî diyar neke, heke dê hetlca wî hêt birin.



Ew gelek caran ecêbmayî dima ji wan pêjmergeyên ku welcî jêran, tiveng bi destên xwe digirtin û hey li wî yê ku berî hevalê xwe, xwe biavêje bo nav çeperên lejkerê îraqê dema êrij dibirin ser. Ji xwe dipirsî "aya ew bi yekcarî natirsin û ev jî li nik wan bûye pirseka lêrahatînê û wekî leyistikekê ew wan êrijên xwe dikin û bejdarî jêran dibin, yan ew jî mîna wî, bi wê mêrxasîberçavkirinê dixwazin tirsaxwe di nava xwe de vejêrin. Dixwest weha yê mêrxas û netirs be, lê ew di xwe de ne didît. Tijtekî din jî ser li wî zivirand; ku hat nav pêjmergeyan, ne dizanî ka çawa tiveng têt bi kar anîn, pijtî karê di Yekîtiya Lawan de, bê hînkirina tivengbikaranînê ew hat hinartin bo nav mefrezeyeka ku kar û îjê wê êrijbirin bûn bo ser çeper û bingehên lejkerê îraqê li deverê. Dema gotî berpirsyarê xwe ku ew nikare biçe nav mefrezeyeka weha ji ber ku ew hêj nizane tivengê bi kar bîne. Berpirsyarî lçir kenî û gotê "Xem nake, tu dê digel pêjmergeyan hîn bibî" Simînofek bi milê wî ve kirin. Wî bala xwe dayê ku di wê girupê de bes wî bi tenê simînof bi milî ve ye û yên din de-

83

bance, klajînkof û arpîçî pê re ne. Pajî zanî ku pêjmerge ji xwe nagirin simînofan rabikin û goya ew ne çekê ciwan û bo jêran xwe j e. Lê li cem wî hemî eynî tijtî bû û heke bi wî bûya wî hema çî çekek bi milê xwe ve ne fikir. Ji tirsan de bi rojekê hîn bû ka dê çawa tivengê bi kar bîne û lca dê wê çawa jêk vebike û bide ser hev.

Bêhna Serdarî gihajtibû serê diftia wî û êdî ne dixwest biçe û çî ne mabû bibêje "Lo ez ditirsim, ma jerm e ku mirov ji jêr û kujtin û birîndarbûnê bitirse? Nê gelo ev ne bi destên

min e, ez dixwazim ne tirsim lê ez ditirsim û ez nizanim ka çima ez nikarim wekî gelean tirsaxwe bivejêrim". Lê jansa wî baj bû, komîteya deverê biryar da ku ew bibe lcadir li deverê digel çend pêjmergeyan bigere. Li komîteya deverê gotinê, ku behsê wî ji aliyê berpirsyar û pêjmergeyên mefreza wî ve hatiye kirin ku ew gelek zîrek û bisteh û bi hedar û zana ye û hemî pesnê wî didin, lewma ew lcar dan wî. Wî got xwe "Heke wan bizaniya ka ez di nav xwe de çawan im, çend yê tirsinok im, dê wan dîtina xwe li ser min biguherta, lê xuya ye wan ez li ser rastiya min nas ne kirime".

Kadirî ji bo wî xwejtir bû, çî tirs tê de nebû, lê cara yekemîn û duyemîn bo wî zehmet bû ku li hember çend gundiyan ku di mizgeftê ve hatibûn xirvekirin, li ser pirsên girêdayî gundê wan bipeyive û dîtina û siyaşeta partiya xwe bigehîne wan. Lê ew hêsan derbas bû û bistehiya axaftin û rewanbêjîyê li hember komên xelkî li cem wî peydabû. Lê zehmetiyeka din ket ber rêya kadiriya wî; li ser gelek pirsan dîtina wî û ya partiya wî yek ne digirt û diviyabûya wî dîtina partiya xwe bigihanda xelkî û ev ji wî re dibû diwariyek. Tijtekî din jî ew bû, ku partiya wî kêmasiyek li ciyekî yan di warekî de bikira, diviyabûya wî ew kêmasî pinî bilcira û derew li xelkî bikirana. Li destpêkê hewil da wekî piraniya kadiran bike yan jî xwe bi ser wan pirsan ve, yê ku dîtinên wî

84

yên cuda ji yê partiya wî li ser hebûn, nebe. Lê ew ne jiya li ser wê metodê berdewam bibe û çend caran neçar bû li ser derbirîna dîtina partiya xwe li ser hinek pirsan ji xelkê re bibêje ku, dîtina partiya wî weha ye, lê ew ne digel wê dîtinê

ye û wekî keselcî dîtina wî jî ku ji ya partiya wî cuda ye weha ye. Ew jêweyê lcadirî û axaftinkirinê digel xelcî li derveyê rêzên rêxistinê ji aliyê berpirsyarên wî ve li deverê bi kêmasî û jajiyek mezin û bi rawestiyên li dijî partiyê hat li qelem dan û ji ber hindê jî destên wî ji kadriyê hatin kêjan û bû ve pêjmergeyek

li komîteya deverê. Lê wî xwe didît neçar ku li ser hinek pirs û probleman bi pêjmerge û xelkê gundên ku lê dibû mêhvan re bikeve munaqejyan û ew hemî dîtî û gotinên wî bi raport ji aliyê gelek "xêrxwazan" ve gihajtin komîteya birêveber û weha destên wî bo demeka ne diyarkirî ji her tijtekî hatin kijandin û êdî ew nema ciyê baweriya berpirsyaran.

Ew çend caran zivirî bo kadirî û pêjmergetiyê û çend caran jî, ji ber nerazîbûna komîteya deverê û berpirsyarên wî li ser axaftin û jêweyê reftara wî hat tecmîd kirin. Wî xwe di nav wan berpirsyar û kadiran de biyanî didît, lê di nav xelkê de, di nav pêjmergeyan de, ew bi wan re hêsan dibûn yek û dikarîbû dostîni û biratiyê çêbike. Wî ji xwe re li wan deverên ku tê de hat û çûn fikir gelek heval û dost peyda kirin.

Carekê endamê komîteya karger ya deverê hinart pey wî, ku çû cem wî, wî kargerî gotê ku mirovekî te ji serkirdayetiye hatiye û pirsyara te dike, ew di odeyê ve ye. Serdar ma heyirî, gelo ew dê kî be ew mirovê wî yê ji serkirdayetiye. Di odeya komîteya karger ve zilamekî 30 salî, tirgalên nû û xwejik li ber, bejin bilind û pir qelew li serê dîwanê rûniştibû. Rûniştineka mîna qiraian û çavên endamên komîteya birêveber bi dêm û devê wî ve girêdayî bûn, te digot qey ew li

benda bereketên wî berpirsyarî ne ku ji devê wî bibarin û bi-  
85

gehin wan, ku ji wan re bibijkure, ji kerema xwe re bi wan re bipeyive û weha hest pê bikin ku berpirsyarek hatiye rêza wan û bi wan re peyiviye. Serdarî ew rûniştin weha zû di serê xwe de jirove kir. Berpirsyarê komîteyê ku bi rex mêhvanî ve rûniştibû, Serdarê di dergehê de rawestiyayî bi mêhvanî da nasandin. Digel hindê ew mêhvan rabû û hemî dîwan jî pê re rabû, mêhvan ber bi Serdarî ve du pêngavan çû û heçku wî bi hindê xwestî agadariyekê bide Serdarî ku tu jî du pêngavan were pêj, Serdarî jî çav li wî lçir û du pêngavan çû pêj.

Wî destê xwe dirêj kir û Serdarî jî wekî wî kir û çû destê wî.

Mêhvanî herdu rûyên Serdarî maçî kirin û got:

- Ez Kemal im, kurê Recebî, neviyê jêxê gundî. Em gundiye hev in.

Wî destê Serdarî li pey xwe kijand û ew bir û bi rex xwe ve da rûniştin. Her çendekê neviyê jêxî gotinek digot û tepek li pijta Serdarî dida û fikir kenî, lê Serdar ne jiya weha hêsan bikeve di suhetê de digel neviyê jêxî yê ku ew, bo cara yekemîn dibîne, kurê wî kesî û neviyê wî kesî, yê ku bavê wî, dayika wî bi dirêjiya wan hemî salên ew di himbêzên wan de jiyaybû, behsê tadariya li ser destên mala jêxî û Recebî li wan hatiye kirin dilçir. Hizra xwe dilçir eger wê gavê bavê wî bihata û ew bi rex tenijta neviyê jêxî, kurê Recebî ve bidîta, dê wî çî bigota Serdarî! Dê hezar tif bikirana navçavên wî ku ew bi neyarê malê re rûdine. Lê Serdarî digel xwe digot xwe "Ew berebavek bûn, digel yekûdu weha xerab û bi jer û kêjmekêj bûn, zû dibûn neyar û zû xwîndarî diket di navbera

wan de û ew hemî pê ne rehet û perîjan dibûn, lê em berebavekî din in, yê hevçerx in, çima em dê di her tijtekî de wekî berebavê berî xwe bin? Bav û bapîrê min û bav û bapîrê Kemalî, her yekî bi jêweyê xwe, egerên ne lihevhatin û ne pev re jiyane diafirandin û ew jî bi dîtina min ji nezanîna wan, ji bînahiya wan ya kurt û teng dihat, lê bo çî em, yan 86

çima ez?". Lewma xwe ne dît neyarê wî kesî, lê dît jî ku sexletên kesîtiya jêxî, yê bavê wî carna behsê wî bo dikir û xwemezinkirina wî di Kemalî û jêweyê axaftin û xwelivandina wî de dihatin ber çavên wî. Dema Serdarî xatirê xwe ji mêhvanê ji serkirdayetiye hatî xwestî, wî Kemalî got berpirsyarê komîteya deverê ku çavê wî bi awayelcî taybetî li Serdarî be û jê re arîkar bin: "Çavên te li gundiyê min bin". O her pijtî wê rojê Serdarî hest pê lîcir ku wê gotina neviyê jêxî û niha jî endamê serkirdayetiye karê xwe li ser endamên komîteya deverê hebû û dostîniya kargerên komîteyê bi wî re xwejtir bû û zimanên wan bi wî re xwej û nerim bûn.

Çar sal derbas bûn, sala 1988<sup>^</sup> bi germa xwe ve bi ser wî de hat. Wî her ji roja hatina xwe hewil da ku peywendiyê bi Çînarê re bike, bizane lîca çî dîke, û ka ew hêj hez ji wî dîke yan na. Wî nikarîbû tijtekî jê bizane, ji ber ku wî bes dîzanî ku navê wê Çînar e û ji Duhokê ye û bavê wê bi hikûmetê re li dijî pêjmergeyan kar dîke. Çînar hertim di hij û ser û mejiyê wî de bû. Wî li deverê gelek keçên ciwan dîtin, gelek bavan jê xwestin ku bibe zavayê wan û wan hez dikir ku keçeka xwe bidinî, lê ew ne jiya xwe ji Çînarê û evîna xwe bo wê dûr bixe. Tijtekî pir ecêb li cem wî hebû; ku wî hizra xwe di

keçeka ku berî çendekê li gundekî dîtî de bilcira, yekser lajê wî radibû, rep dibû û di endêjeya xwe de, pê re radiket û dildarî dilcir û pijtî ku xwe bi destên xwe, rehet dikir, ew keç ji bîra wî diçû. Çinar hertim di endêjeya wî de bû, lê wê bi wê amadebûna xwe lajê wî ranedikir û rep ne dikir. Serdarî ew hest û kartêkirin bi encama evîneka paqij û rûhî dizanî û wê evînî ew bi hemî ve dagîr kiribû.

Rojekê xortek ji Duhokê hat, ew ji lejkerê îraqê fîlar bûbû û mala wan li Duhokê bû. Serdarî jî bi derfet zanî ku pirsyara Çinarê ji wî kurikî bike. Wî pê dan ser jermê û ji wî kurulcî re got ku keçek heye û navê wê Çinar e û xwendekara be-  
87

ja matematîkê li zankoya Mûsilê bû û mala wan li Duhokê ye, lê nizane lca navê bavê wê çi ye û dixwaze bizane lca ew keç nuke çi dike. Pijtî gelek hizirkirinê û kirina behsê keçên Duhokê ji aliyê wî xortî ve, ew xort bi ser hil bû ka ew behsê kê dike û gotê:

- Ew ji maleka gelek pîs in, lê xortî lêvên xwe miçandin ser hev û berdewam bû, bibore neku mirovên te bin?
  - Xem nake, Serdarî got, ew ne mirovên min in û min guh lê bûye ku bavê wê bi hikûmetê re lcar dike.
  - Kar dikir, xortî got.
  - O niha kar nake, Serdarî zelal kirin jê xwest.
  - Diyar e tu nizanî ku bavê wê û mêrê wê hatine kujtin!
  - Bavê wê hat kujtin û wê mêr jî kir û mêrê wê jî hat kujtin?
- Serdar di ciyê xwe de velerizî dema wî ew pirsyara xwe bi mendehojî avêtiye ber wî xortî.

Wî xortî dest pê kir bo Serdarî behsê Remezanê bavê Çinarê

Icir û ka wî çawa Çinar bi xortî da pismamê wê û çawa Çinar bi xwe li dijî wî jûyî bû û wê mêrê xwe ne diviya û heta di van dûmahiyên de dihat gotin ku wê hez ji xortekî li zankoya Mûsilê dilcir, lê xort lê berze bûye û nizane ka çi bi serê wî hatiye. Serdarî xwest wê gavê bibêje wî xorrî ku hema ew ew, yê ku hez jê dikir û hez jê dike, li ber te ye, lê qurçek li gewriya xwe da û rê da xortî ku li ser axaftina xwe berdewam bibe.

- Mêrê Çinarê jî bi mamê xwe Remezanî re ket nav wî lcarê wî yê pîs yê sîxurî, çeteyî û derketinê digel parastinên lejkerê îraqê bo lêdan û giritina opozisyona kurd û pêjmergeyan û kes û karên wan. Ew bû, berî du mehan, herdu; mêrê Çinarê û bavê wê digel çend serlejkerên îraqê ketin nav boseyeka çend pêjmergeyan û ew herdu digel çend serleşkeran di encama jerî de hatin kujtin.

Serdarî agah ji kujtina wan çend kesan hebû, lê wî, wê de-  
88

mê, ne dizanî ku yek ji wan bavê Çinarê ye û yekî din jî mêrê wê ye.

Xeberê ku Çinarê jûkiribû ew têk hejand û nûçeya kujtinê jî, her çend bû kêfa wî bi çi kujtina ne dihat, ew bi hêvî xiste ve ku ew Çinarê bibîne û bigehe miraza xwe digel wê. Dixwest ji wî xortî bipitse ka wê zarok ji mêrê xwe hebûn yan na, lê di xwe re ne dît pirseka weha bike. Xortî, berî ku ji cem wî rabibe û biçe tijtekî din jî gotê:

- Çinar û dayilca xwe ne mane li Duhokê. Min bihîstibû ku herdu hatin e cem xalê wê li gundekî li vê deverê, lê ez nizanim kîj gund e.

Wê nûçeyê hindî dinyayekê dilê wî jad kir. O derfet jî li ber wî velcir ku wê pirsyara xwe ya ku jerim kirî bike biavêje ber wî xortî:

- Te got ew herdu? Pa zarokên Çinarê li cem kê ne?

- Çinarê çi zarok nebûne, Xortî got. Kes jî nizane ka binas çi ye; ka wê zarok nabin yan wê ne xwest, ji wî mêrî, zarokên wê hebin.

Bo Serdarî hertijt diyar bû û ne zanî bo çi, lê di nav xwe de yê pijt rast bû ku evîna wê bo wî ne hijt ku ew ji mêrê xwe zarokan çêbike. Wî hest pê kir, ji berê bêtir, evîna wî bo Çinarê keliya û agir berda bin pêyên wî û hizra wî ket ser hindê lca ew dê wê çawa peyda bike. Pajî di nav xwe de biryarek da ku gundên deverê yek bi yek bide berêk û li dû Çinarê bigere.

Di wan rojan de serûberê deverê ne baj û li ber têkçûneka mezin bû. Îraq ji jerê xwe digel îranê derketibû. Dixwest tola xwe ji kurdan vebike, goya ew di jerê îranê de bi îraqê re ligel îranê bûn. Lejkerê îraqî dest bi êrija ku bi Enfalan hatiye nav kirin kir û ber bi deverê hat. Serdarî sê gund serûbinêk kiribûn û hêj Çinar ne dîtibû û hêj gelek gund mabûn.

Gelek kesên ku ew baj nas dikir ji wê reftara wî ya nû ku di 89

nav gundiyan de digeriya û diçû hindav kaniyên avê û kolkên balavan û çavên xwe li jinan boq dikirin, ne rehet bûn û digotinê "te xêr e malava, te çi caran weha ne lciriye û tu çi caran di nav jinan de ne hatî û ne çûyî".

Wî guh neda wan gilî û gazinde û dalehiyan û li ser geryana xwe bi dû Çinarê ve berdewam bû. Ê dema ji hinekan



dibihîst qala wî dilcin û dibêjin ku ew dîn bûye, bîra wî û Saloyî û serhatiya wî dihat û bi hindê baweriya wî bi xwe û peydakirina Çinarê bi hêztir û mezintir dibû. Nûçeyên devkî ji vir û wir dihatin, goya ha vaye lejkerê îraqê hat û dibêjin dûr nîne çekê kîmyewî jî bi kar bîne û wan nûçeyan tevliheviyek di nav xweciyên deverê de peyda kir. Lê bêgavî û nebûna agadariyên resmî ji aliyê birêveberiya pêjmergeyan ya bilind ve bo xelkê deverê, ew hijtin li benda lca dê ew nûçe rast bin ya na. Û êrij hat, balafiran kerb û kîna xwe ya kujek vala lcir, bihustekî axê nema ku çend top vê ne ketin, xelk heziqî, jepilî, lejkerê îraqê hat, revê dest pê kir, pêjmergeyan jî da dû mal, jin û zarok û kes û karên xwe. Xelkê xwe dît bê pijt, bê bergirî û revê, li hember sehma çek û lejkerekî kujek, dest û pê bi wan ve kirin. 1975<sup>^</sup> û setimîna wê serhildana çekdar bi hemî ve hat ber çavên Serdarî û lca çawa di gavekê de, ew pêjmerge ketin û ka çima ew rû dide. Ji xwe dipirsî: "Erê gelo ev ji lawazî û nezanîna me ye, ev ji perçebûn û neyekgirtina me ye, yan ev ji vê metoda xebatê ye, ji nebûna armanc û stratejiyeka hevbej û zelal ya hêzên siyasî yên kurdan e, yan ji ber ku em bê pijt in û komelgeha navneteweyî arîkariya me kurdan wekî pirseka siyasî nake, yan ji hindê têt ku serkirdeyên me xwe lcirine leyîstik di destên dagîrkerên Kurdistanê û kenkeneyên cîhanê de û hêviya xwe û çarenivîsa xelkê xwe bêtir bi dewletên mezin ve girêdane?". Wî ew pirsyar ji xwe dikirin, lê bersivên wî li ser pirsyarên ji wî rengî jêlhayî dihatin û çawa ew xebat bi rêveberî û metodên wê

90

ve li ber çavên wî pir aloz û ne zelal bû weha bersivên wî jî aloz bûn.

Digel revê û tirsî kîmyewî û ha bi ser de girtina lejkerê îraqî, wî xwe di wan gavan de ne dît yê tirsîyayî, evînê hêzek da wî ku haya wî ji çî tirseke û ji çî tijtekî din nebe. Ew diket nav xelkî, arîkariya wan li gor pêçêbûna xwe dilcir, lê hij û çavên wî li dû Çînarê digeriyan. Wî hest bi hindê fikir ku bîstehî li cem wî çêbûye û bersiv jî dihat ku binas evîn e, tijtek e ku te bawerî pê heyî û ew ji aliyê rûhî ve hêzê dide te, te radigire û tu pê mukum dibî û tu hemiyê dikî ku xwe bigehîniyê. Nêzîkî Sinoran dibûn. Du pêjmergeyên ku wî nas dikirin û hevalên wî yê herî baj bûn, li aliyekî rêyê rawestiyabûn û gazî wî fikir.

Ber bi wan ve çû. Wan ji wî xwest ku ew bi wan re biçê, ji ber ku di wê nabeynê de bes ew sê kes bi tenê li wê derê çekdar bûn û wan got ku çend malên reviyayî û piraniya wan jin û zarok in ketine di dorpêçkirineka hêzelca lejkerê îraqî de, di newaleka wêveyî wan de û ew dixwazin biçin hindav û bi dûrbînê temaja bikinê, ku ji dest wan bihêt, hewil bidin wan xelas bilcin.

Serdarî jî xwe da digel wan û piştî ku çûn hindav newalê û ji bilindahiyê temaja kirî wan kesan, wan dît ku rast e, çend kes, nêzîkî sih çil kesan, di newalê de ne û lejkerê îraqî pêjiya wan girtiye û ew jaj û tirsîyayî li ciyên xwe rûniştine. Ji wan hevalên Serdarî yê pê re, yekî kelex mezin yê wekî çelekan dirêj hebû, navê wî Herman bû, wî nexjek her wê gavê bo ku xwe bi xwevedizîn bigehînin wan malbatan û wan ji nay lepên lejkerê îraqî xelas bilcin, çêkir. Ne hind hêsan bû

ku xwe bigehînin wê derê û Serdarî di wan delîveyên hind tengav de pirsyar ji xwe dilcir aya gelo her hevaleyê ji wan yê wê gavê bi wî re bûn Çinareka xwe heye ku hêzê û bîsteyî

hiyê bideyê ku weha xwe bide bo nav wî agirî? Ew hersê bi silametî nêzîlcî wan malbatan bûn, ku wan kesan jî ew ji dûr ve dîtî, pir kêfa wan hat û gazî lîcîrî hevûdu "pêjmerge hatin, li hawara me hatin". Her digel hindê ji her aliyê ve gule barîn û kelex jî ketin. Hermanî bang kir "bîkevin ser zikan, ser zikî". Xelk jaj bûbû, kesine hebûn ji tirsan de guhdariya wî lîcîrî û kesine weha jî hebûn ku ji tirsan de jaj bûbûn û ne dizanî ka çî bikin û hema temajayî dewr û bera xwe û yekûdu dikir û mabûn li benda ew û jansa xwe û weha gelek ji wan kesan hatin kujtî û dema ew herpênc gihajtî nîk wan malbatan bes çwarde kes jê mabûn. Her yekî çend ji wan dan pêjiya xwe û jê xwestî ku xwe li ser zikan bixijînin heta xwe digehînin geliyê li pêjiya xwe û hîngê ew ji destê lejkerî derdikevin û dikarin xwe bigehînin sinoran. Topan dest pê kir û wan jî lez li xwe kir. Gihajtî geliyê û li wê derê wan lejkerê îraqî li pijt xwe hijtibû. Lê ew ji tirsan de hêj dibezîn û zû diçûn û rawestiyana wan nebû. Du peya, neh jin û sê zarok bûn, serkol, pêxas, pê lê jeqjeq bûyî, xwîn ji ber birînên pê û destan derdiket. Çav di seran de zîqbûyî, sehim û tirs di nav çavan de perçivî, ew bi rêberiya wan her pêncan nêzîkî sînorên ku dagîrkeran di navbera kurdan û kurdan de çêkirine, dibûn. Hêviya wan ma bû bes bakûrê Kurdistanê, ku hema bigehînin cem birayên xwe yê kurd li rexê din. Haya Serdarî du sê caran ji dengê hebekê ji wî re niyas bû ku

dibêje "dayika min hat kujtin, dayika min nema, kesê min nema, wey li minê xwelî pê werê", û hevalekî wî dibêjeyê "Xwîjkê lezê bike û tehemulê bike".

Ku cara çarê dengê wê hatiyê, Serdar li ciyê xwe rawestiya û li pijt xwe zivirî û bo paj de çû. Hermanî, ku li pijt wî bû, pirsyar jê lcir:

- Serdar, bo kî ve?

- Tu berdewam be, ez, bes dê temaja bikim ka hemî tên,  
ŞX

Serdarî gotê.

Lê, di rastiyê de wî dengê ku bi guhên wî ketî, ew ber bi xwe ve kêja. Berî dûmahiya wî karwanê reviyayîyan bi sê kesan jinelca pir bê serûber bûyî, car rûdinjt û car jî radibû, gelek lawaz û kesîre bûyî, bala wî kijand. Dilê wî vecininqî, ku ew nêzîkî wî bû, êdî wî çî guman di hindê de ne man ku ew Çinare.

- Çinar, bi dengekî kizgiryokî û bi xirîqênê ve hevîrkirî got û di rêya Çinarê de rawestiya.

Ku Çinarê ho navçavên xwe bilind lcin û temajayî wî kesê li ber xwe lcin û Serdar tê de niyasî, hema yekser lertzîkek hatê, kenî û giriya, xav bû û çî nemabû bikeve erdî, lê Serdarî xwe da ber û ew vegirt û li ser erdî razand. Hindî Serdarî gazîkirê ku wê hijyar bike, lê wê çav li xwe venekirin. Herman li Serdarî zivirî û hat ser wî kelxê di himbêzên wî de.

Her zû wî zemzemeyê xwe yê avê ji ber qawîja xwe anî derê û av li nav çavên wê rejand. Çinarê bêhna xwe hilkêja û pajî çavên xwe vekirin. Temajayî Serdarî lcin û herduyan hevûdu himbêz kir û giriyan û kenîn.

Hermanî ji wan xwest ku rabin û bi rê bikevin û xwe li sinoran derbas bikin, hêj lejkerê îraqîyan ne gihajtî wan.

Di rê de herduyan destên hevûdu girtin û ber ne dan bo ku êdî ji hevûdu dûr ne kevin. Ji kêfan de axaftin ji ber wan ne dihat. Her car bo car, da berê xwe dine hevûdu, ku çavên wan berhingarî yekûdu dibûn, xwe di yekûdu de werdikir û bîstkekê bi hevûdu ve nûsiyayî diman û pajî berdewam dibûn ve. Ew direviyan, lê haya wan ji lejkerê îraqê nebû.

Wan dixwest bigehin ciyekî ku lê bijên xwe bi rehetî bo hevûdu rabiwêxin û dilên xwe yê perîjnabûyî bo yekûdu bikelêjin.

Li ser sinoran, hindî ku Serdar û Herman û Rêber ku hevalên yek bûn, wan ne xwest xwe bidin dest lejkerê tirkan û

93

çarenivîsa di wan gavan de ne diyar. Ê wan got ku ew dê biçin gundekî ku nêzîkî Çelê ye û xalê Hermanî li wê derê ye û dê hewil bidin li wê derê bimînin heta ku derfet çê bibe û vebigerin bo devera jê hatîn. Çinar jî digel Serdarî ma û yên din ber bi lejkerê tirkan ve çûn ku rê bidin wan ew bikevin nav rexê din yê sinoran.

Xelkê gundî hatin berahiya wan û her yekî xwest wan bibe mala xwe û ji wan re di wê tangasiya wan de bibe arîkar. Pijtî mana çar mehan li wî gundî, Çinarê, li ser destê melayê gundî, jû bi Serdarî lîcir. Wê got ku kesekî wê ne maye û birayê wê jî di revê de jer kir û hat kujtin. Wê ji Serdarî re behsê birayê xwe Behzadî kiribû. Ka çawa, dema birayê wê serbaz bû di lejkerê îraqê de, ew ketibû beramberî sê alternatîvan ku yekê bo xwe jê hîlbijêre; biçe berokê jerê îraqê bi îranê re, bi nav bibe çeteyê bavê xwe û pênasnameya çetîniyê

bixe di berîka xwe de û neçe çetîtiyê, lê li jûna hindê kar û barên buroya bavê xwe ya avakirina xanî û avahiyan bi rê ve bibe, yan jî ji wan herdu alternatîvan bireve û biçe nav pêjmergeyan.

O wî alternatîva sêyemîn hilbijart û bê ku pirsyara xwe bi bavê xwe bike, bi xwevedizîn û bi qeçaxî xwe gihande deverên rizgarkirî û her zû keça xalê xwest û Evîn bû jina wî. Pijîti ku bavê wê û mêrê wê hatin kujtin, Çinar û dayika xwe jî hatin deverên pêjmergeyan, nik Behzadî. Di jerekî de li hember êrija lejkerê îraqê Behzad hat kujtin. Dema revê dest pê kirî haya wan ji Evînê û malxalê nema, ji ber ku ew wê rojê li gundekî din bûn û wê ne zanî ka çi bi serê wan hat. Malxweyê ma | a ku ew lê mêhvan, li jûna bavê wê, bi amadebûna melayê gundî, destûrî da û weha herdu; Serdar û Çinar gihajtiri miraza xwe û bûn jin û mêrên yekûdu û bi ya wan, xwejtirîn rojên jiyana wan li wî gundî dest pê lacin. Xweciyên gundî gelek hez ji wan kir û ew welcî keç û kurên xwe dîtin. Serdarî jî dest pê kir di karê rez û baxan û lcarûba-94

rên din de arîkariya xalê Hermanî û gundiyan kir. Wî xwe ne dît biyanî li wî gundî; bi zimanê wî tê axaftin, stiran û lawik û laveje, payîzok û çîrok û çîvokanên wan jî her yên rexê wan in, jiyana wan jî mîna ya li gundên bajûr e. Hest û nestên xelkê gundî jî her eynî hest û nestên wî ne. Her tijtê wan yek e ji bilî tijtekî wehmî bi navê sinoran ku di nav bera wan de hatiye destnîjankirin û di têkiliyan de wan sinordar dike. Rojekê çend çekdar hatin gundî, bi cil û kincên partîzanan bûn. Hatîn wê mala Serdar lê bi cî bûyî. Malxweyê malê, xalê

Hermanî, ji Serdarî re got ku ew çekdarên partiyeka kurdî ne. Serdarî jî digel xwediyê malê bi xêr hatina wan kir. Pijîtî rûniştin û pirsyar jê kirinê, wan çekdaran got Serdarî ku ew dizanin ku ew di filan partiyê de bû û ew partiya ew tê de bû partiyeka burjuwa û xwefiroj e û mafê wan tune ye ku li devera wan bimînin, çinkî ew li dijî partiya wî ne.

Serdarî jî dîtina xwe bo wan got ka ew çima di wê partiyê de bû û çawa ketibû nav wê û got jî:

- Ya din bira, ez bikevim nav rêxistinekê yan ne kevîm nav, ew pirseka taybetî ya min û her kesî bi serê xwe ye. Niha reviyayîyek im, me hawara xwe aniye cem xelkê vî gundî û wan em hewandine. Ez wekî kesekî li vî gundî dijîm û ew jî bi xêra xelkê vî gundî û qenciya wan digel min kirî. Ez niha endamê çî partiyên nînim û hurmeta min bo we û dîtina û xebata we heye û ez mayê xwe di kar û xebata we de nakim û ez bi çî rengê ne li dijî we û ne li dijî çî part û hêzeka din ya kurdî jerî dilcim. Ku dîtina me yê cuda hebin ew nayê wê manayê ku em dijminên yek in û divêt jerê hevûdu bilcin. Wê carê ew çekdar çûn, lê pijtî jej rojên din hatin, jev bû, wan bangî Serdarî lcar, goya lcarê wan bi wî heye û dixwazin ku bi wan re biçe derve û dê pajî bizivire. Serdar jî bê ku gumanê bibe ser wê gotina wan û ji xwe êmin rabû û bê tiveng

95

bi wan re derket. Xwe, wan her di rojên yekemîn de ji hatina xwe bo nav gundî, û ji bo ku çî belayekê ne înin serê gundiyan, wî û herdu hevalên wî tiveng û fîjekên wan tivengan, pijtî ku baj bi naylonî werpêçabûn, li derveyê gundî vejartibûn. Çinarê gotê neçe, lê wî dilê wê rehet kir û gotê ku hemî

bîstkek e û ew jî mîna wan kurd in û xuya ye pirsyareka wan heye, yan arîkariyekê ji wî dixwazin û tijtê wî pê çêbibe dê ji wan re bike û ew dê bizivire. Li der ve Serdarî Herman û Rêber jî bi wan çekdarên kurd re dîtin, û hersê digel wan çûn. Ê her bû ew derketin û Serdar ne hat, Herman û Rêber jî ne hatin. Bû nîva jevê û kes ji wan diyar nebû. Ew mala ew lê akincî bûbûn û pajî hemî gundî derketin û li dû wan geriyan. Li binê gundî kelexên Herman û Rêberî hatin dîtin. Ziman li wan hatibûn birîn û pajî hatibûn kujtin û li ser her kelexekî kaxezek hatibû çespanandin û li ser kaxezê bi tirlcî hatibû nivîsandin: "Ev sizaya xainan e". Ê goya xiyaneta wan ew bû ku berî hîngê çekdarên hêzelca siyasî ya kurdî, ne ya wan çekdaran bûn, û bi wê çendê hatin tawanbarkirin û kujtin. Di jev û tariyê de dadgeh û biryara dadgehê û sizadan û qanûn, hemî, lûliyên gerim û gulleyên kore yên tivengên çend çekdarên jevê bûn.

Çinar wekî dînan lê hat, berda girî û pora xwe veçirand û rondikên hemî dinyayê ji çavên xwe barandin. Behî û taziya wê mezintir bû, ji ber ku wê ne zanî ka çi bi serê Serdarê wê hat; hatiye kujtin û di çalekê de vejartin, hatiye girtin û êxsîr lçirin yan jî ew bo xwe ji destên wan verestiye û reviyaye. Xem xema gundî jî bû, wan ne dixwest jiyan weha berdewam bibe; ew bimînin di navbera zordariya dagîrkerî û neyariya navxweyî de, ser û mîrên wan gelek bin û hertim li dijî yek û du bin, bêtir neyarên xwe bin ji hindê ku neyarên dagîrkeran bin. Ji her aliyê ve tirs û sehim li hindav serên

96

wan bû. Hêvî hebûn lê bi reftarên ji wî rengî hêvî ne dibijxivîn,



lê berûvajî wê bêtir diçirmisîn.

Çinar li wî gundî akincî bû. Roj û meh û sal derbas bûn û wê malbata ew li cem, mala xalê Hermanî, ew wekî keça xwe, di nav xwe de hewand. Wê malê kurek hebû, bi du salan ji wê gencîr bû. Kurekî hindî dibêjin yê guhdar û rehet û cwamêr û jîr bû. Rojekê bavê wî kurî gote Çinarê:

- Keça min, xelkê gundî û rêvingan çav berdane ser te û got gotka belav dikin. Baj e ku tu jû bikî û qet nefikire ku mebesta min ew be ku te ji nav mala xwe derbixim. Berûvajî wê û eger bi dilê te be, gelek bi dilê me û kurê me ye ku tu bibî jina wî.

Çinarê zanî ku ew mirov rastiye dibêje û gotinên wî saxlem û bê firt û fêl in. Mêrkirin, ji nû ve binkofk avakirin, qet ne di serê wê de bûn, û ne jî dilcarî xwe bi jiyaneke ji wî rengî qayil bike. Serdar, her di hij û hizr û dilê wê de bû û xemê qet xwe ji dilê wê bar ne dikir. Lê Çinarê, digel wê hemiyê, rastiya gotinên malxweyê malê welcî rohiya rojê her roj didît, lewma wê, di dawiya dawîn de, pêjniyara wê malê qebûl kir û jû bi kurê wê malbata ew li cem xwecîbûyî kir. Ew berî wê jûkirina xwe ji Serdarî ducan bûbû û pijtî wî jûyî ew zarokê wê bû. Mêrê wê navê wî zarolcî ku kur bû, kir Serdar.

Gundiyan, li ser daxwaza Çinarê, gorek bo Serdarê ku çî jê ne hatibû zanîn li cem gorên Herman û Rêberî çêkir. Mêrê wê dixwest ku zarokine wî ji Çinarê hebin, lê wê, ne dizanî ji ber çî, lê ne dixwest ku wê zarok ji çî kesekî din hebin. Mêrê wê jî li ser hindê, gelek li dû wê dirêj ne lçir. Çinar hemî rojên îniyan diçû ser gora Serdarî û hevalên wî. Serdarî ji gora xwe jî hêzeka rûhî dida wê û weha li wê dikir ku çawa nerazîbûna

di nav wê de li hember tadakarî û siyaseta perçiqandinê  
ya dagîrkeran zêde dibû, dehqatî wê jî nerazîbûna di  
nav wê de li hember neyariya navxwe û sûçdar û amrazên wê  
97

zêdetir dibû. Sedqata ji wê zêdetir dijminatîya wê bo nezanînê,  
nexwendewariyê ku bi ya wê egerên wan hemî karesatan  
bûn, çêdibû.

Çînarê xwe hînî xwendina bi tîpên latînî kiribû. Ji ber ku,  
li bajûrê Kurdistanê, ku di bin desthlata îraqê de bû û îraq  
jî dewleteka erebî ye, xwendin û nivîsîna zimanê kurdî bi tîpên  
erebî bû, evca wê jî bi wan tîpan kurdî dixwend. Lê li  
bakûrê Kurdistanê ku di bin desthilata Tirkiyeyê de bû,  
xwendin û nivîsîna kurdiyê bi tîpên latînî bû û ji wê re pir  
hêsan bû ku hînî wan tîpan jî bibe, ji ber ku wê ingilîzî  
xwendibû û tîpên kurdiya latînî jî nêzîkî yên ingilîziyê ne.  
Pijtî ku baj hînî wan tîpan bû, xwest rijtekî bike ku hem  
xwe pê mijûl bike û hem jî weceka wê bo xelkê wî gundî, jê  
hebe. Li wî gundî çî dibistan nebûn û zarokên gundî diçûn  
ba melayê gundî û hînî zanistên dînî, Quranê û hedîsan dibûn.  
Çend pirtûkên helbestên Cegerxwînî û pirtûkine din  
ku bi tîpên latînî hatibûn nivîsandin ketibûn destên wê. Wê  
jî û pijtî pirsyarkirinê ji dayûbavên zarokan, dest pê kir li  
mala xwe dersên zimanê kurdî dan kurê xwe û zarokên gundî.  
Ji wan re, di dersên xwe de qala giringiya zanîna û xwehînkirina  
xwendin û nivîsandinê û xweperwerdkirinê kir. Ji bo  
wan diçû ser qala folklorê kurdan, çîrok û serhatiyên wan,  
yarî û leyîstikên zarokan. Çînarê di nav xwe de hizrek ava lçir  
û dixwest li gor pêçêbûna xwe wê hizrê biêxe jiyanê, ew jî ew

bû ku nabe xelkê wê jerê dagîrkeran di qorneteka teng bi tenê de bike, lê divê wî jerê xwe derbas bike bo berxwedaneka mezin, li ser berokên berfireh û li hemî cî û waran bike. Li malan, li gundan, li bajaran, bi kultur û zimanî, bi xwe pêjdebirinê, bi avakirina welatê xwe, bi desdiilata zanîn û pereyan. Lê wê dizanî ku ew hizrên wê ne û ew nikare bi xwe bi tenê û bê lcarekî rêxistî wan hizran bi can û jiyana biêxe, lê ew ya ji xwe pişt rast bû ku ew piçeka ew li wî gundê, di wî geli-  
98

yê tarî de, li wî gundê bi çiyayên bilind dormandorkirî dike, dikeve ser xebat û bizava gelek kesên mîna wê li gelek ciyên mîna gundê wê û di dûmahiyê de, rojek dê bêt ku ew hemî ked û renc û xebat û bizav xwe bidin yek û berhemê xwe yê li gor hez û dilê wê û dil û daxwzên xelkê wê bidin.

Çinar bi berdewamî, rojên îni diçû ser gora Serdarî û hevalên wî û bi xwe re Serdarê xwe yê biçûk jî dibir. Ew demek bû bala wê ketibû ser zilamekî, li bin darekê, li hember wan goran, çend metran dûr rûdinijt û temajayî wê û zarokî û goran dikir. Li destpêkê ji wî tirsîya, lê paji bi hebûna wî zîlamî, li wê dûratiyê, herçend bû navçavên wî jî ne didîtin, di xwe de hest bi êmna hî û rehetiyê dikir. Ne dixwest biçe û temaja bike ka ew kî ye û her weha ne dixwest ku ew peya ji wî ciyî wînda bibe.

Weha bi hebûna wî zîlamî ve hat girêdan ku hatina wê ya rojên îniyan bêtir ji hatina ser goran bo dîtina wî bû ji dûr ve, li bin wê darê. Qute quta dilê wê kêfek û tirsek dida wê ku ew nikarîbû xwe li ser hindê yek dil bike.

Wê dizanî çî zû û çî dereng dê perde ji ser wê nihîniyê rabibe

û dê ew dûçarî biryardanê bibe. Lê çi biryardan? Ew dê pijtî jûkirinê û hebûna mêrî biryareka çawa bide? Wê berî hertijtî dixwest ku zarokê xwe, Serdarê biçûk, di malekê de ku dayûbavînî tê de hebe, bi xwedî bike û ew li cem wê armanc û erka wê ya serelcî bû.

Ew roj hat û xwezûrê wê, êvarekê hat mala wê û mêrê wê jî pêre bû û herduyan li hevûdu dinerî û gotina çi kesî ji wan ne dihat. Çinarê fehim kir ku pirs pirs a wî zîlamî ye û wan pê zaniye û niha hatine ku ji wê re bibêjin lê ditirsin bibêjin. Ditirsin ku bi gotina wê rastiye ew, Çinarê ji dest xwe bidin û diyar bû ku ew wê çendê naxwazin, lê herweha nawxazin wê biêjînin û li dijî miraz û xwesteka wê rabiwestin û naxwazin rastiye li ber wê bivejêrin.

99

- Mêhvanekî me heye û dixwest te bibîne, bavê mêrî gotê.
- Kî ye, Çinarê pirsyara xwe bi tirs û jerim kir.
- Serdar e, bavê mêrî got.

Çinarê dizanî dê ew be û dixwest ew be, lê li wê dûratiye bimîne, li bin wê darê, li rojên îniyê li benda wê be û ew hest bi hebûna wî bike. Lê niha perde hat hildan û hemî tijt ejkere bûn û ew ket hemberî rastiye.

Wê, bi Serdarê biçûk re da dû xwezûr û mêrî, hersê bê deng, bi xem û kesîre bûn û di Çinarê de kêfek jî, kêfelca ne zelal dixulxulî. Hindî nêzîktirî mala xwezûrî dibû qute quta dilê wê bêtir lê dihat û pê lê sist û xav dibûn û serên rêyan li ber berze dibûn.

Di hundirê odeyeka ji kerpîçan çêkirî de li wî gundê li rojhilata dinyaya Ji bîrkirî wê çav bi Serdarî ketin û yên wî bi

wê ketin. Peyayekî rihberdayî, cildirhayî, bêhna pîs jê difirî,  
li ber wê rawestiya û çavên Serdarî di dêmê wî de li çavên wê  
geriyan û di wan gavan de çavan ya dilan gihande dilan. O  
heyameka xwey herdu, xwezûr û mêr jî, Serdarê biçûk jî,  
man rawestiyayî. Serdar ji ciyê xwe livî û ber bi wê ve çû, nêzîkî  
wan rawestiya û destê xwe yê rastê danî ser serê Serdarê  
biçûk û xwest tijtekî bibêje lê diyar bû ku nikarîbû bibêje.  
Di wê gavê de xwezûrê wê gotê:

- Ew nikare biaxive, wan bê bavan ziman li wî biriye.

Rondik ji çavên Çinarê barîn û giriya û xwe di Serdarê biçûk  
werkir û bi çavên rondikîn berê xwe dida çavên Serdarê  
mezin yê li ciyê xwe mayî neliv û du sirkên rondikan wekî  
du sûlavan ji herdu çavên wî bo ser rûçikên wî yên westiyayî  
dadiketin xwarê.

Xwezûr û mêrê wê ji odayê derketin û ew bi tenê hijtin,  
ew hersê, ew û Serdarê biçûk û yê mezin bi tenê di wê odayê  
de û wan derî, li pijt xwe hijt li taq vekirî.

Ew herdu li hember hev rûnijtin û wê destê Serdarê biçûk  
ioo

girt u gote:

- Kurê min ev bavê te ye, here di himbêza wî de rûbine.

Dema zarok nêzîkî wî bû, wî ew girt û hêl himbêz lîcir û giriyeke  
kûr û cergbir ew girt.

Pijtî çendekê Çinarê behsê serhatiya xwe û jûkirinê kir û  
pirsyar ji wî kir ka çi bi serê wî hat û ew wê hemî dernê li kî  
derê bû.

Serdarî jî, ji ber ku nikarîbû biaxive û dizanî ku divêt ew  
serhatiya xwe û ka çi gotin ji bo wê heye binivîse û deyne ber

çavên wê û bi nivîsînê bi wê re bipeyive, lewma wî berî wê hevdîtinê çîroka xwe nivîsîbû û wê gavê ew kaxezên ku li ser nivîsandî ji berîka xwe derxistin û danîn ber wê.

Wê ew lcazez rakirin û xwendin:

"Wan çekdarên wê jevê em hersê birin binê gundî û dengbir xistin ser debanceyekê û li destpêkê zimanê min, pajî yê Hermanî û pajî yê Rêberî jê vekirin. Pajî bi wê debanceya dengbir li ser devê wê, Rêber li ber çavên me gulle baran lcar û gotin: Ev dê ji xelkê van gundan re bibe ders ku li dijî me ranewestin, ku digel çi hêzekê ji bilî me kar ne kin, ku kesên wekî we di nav xwe de ne hewînin. Pajî ger hat ser Hermanî, wan li pêjyê li wî xist û ew raxijand û pajî ew jî da ber gulleyên wê debanceyê û ji min re, yê pijtî wê hemiyê nîvrihbûyî gotin: Tu dibînî ka em dikarin çi bikin. Hûn dixwazin bi imperyalîzmê re kar bilcin, de bixwin. Di wan gavan de ez tam jaj bûbûm û min ne dizanî ka ji ber çi ew weha li me dikan û min ew axaftinên wan fehim ne dikirin. Ez ne jiyam ji çavên xwe bawer bikin ku çakdarine kurd kurdan dikujin, û jerê xwe yê ku diviyabûya wan li dijî dagîrkerê axa xwe bikira ew li dijî kurdê xwe bi xwe dikan. Min nikarîbû têbigehim ka wan ji tirsî çî zimanên me jê vekirin. Ma eger ew rast bin di xebata xwe de û wan bawerî pê hebe ku ew ji bo rizgarkirina welatê xwe û azadkirina xelkê xwe têdikojin, 101

ew çima ji zimanên me ditirsiyan. Di wan gavan de bes tu ji min re hêz û hertijt bûyî û ji bilî wê min xwe didît bi tenê di dozexeka bê eman û jewitîner de.

Pijrî wê, xwediyê debanceyê hat ser kelexê min yê pijtî jêvekirina

zimanî û li ber dirb û pehînen wan li erdî terajbûyî  
û xwest min jî, wekî herdu hevalên min, bikuje. Lê ji pijt wî  
ve dengê hat, gotê raweste û diyar bû ku ew berpirsyarê wê  
girupê bû û wê hemî demê ew li ser kevirekî rûniştibû û berê  
xwe dida leyistika ku wî nexje jê re kijandibû.

- Min hizrek heye, wî berpirsyarî got. Em vî nakujin. Ev  
êdî nilcare bipeyive û tirkîyê jî nizane ku pê binivîse. Em dê  
tivengêka bê gulle bikin di destên wî de û wî bibin ber devê  
qereqoleka rirkan û li wir bihêlin. Ku cendirme wî bibînin,  
ew dê wî derhal, her ji dûr ve gullebaran bikin û dê weha bê  
gotin ku me bi ser wan de girtiye û goya wan yek ji me kujtiye  
û dê weha nûçe çê bibe û dê ev xayîne jî hêt kujtin. Weha  
em bi berekî du çivîkan dikujin; em ji vî xelas dibin û em  
balkijiyê jî bo ser xwe çêdikin. Kî dixwaze wî bibe nêzîkî qereqola  
deverê.

Ez, yelcser yekî xwe pêjniyar kir.

Ew kesê ku xwe pêjniyarkirî, zilamekî gelek kin û dêmesmer  
û simbêlbor bû. Ew bi tiveng û debance û fîjekan yê  
karkirî bû. Pijî erêkirina xwepêjniyarkirina wî ji aliyê berpirsyarî  
ve, wî pijî ku bi werîsekî destên min ji pijî ve girêdayîn,  
ez bi tivenga xwe paldam û dame pêjiya xwe û ez û  
ew bi rê ketin. Min di wan gavan de ne bes dil bi xwe û we  
ve bû, lê dilê min bi wî çekdarî û hevalên wî ve disot. Ji ber  
ku min hest bi hindê fikir ku ew di nav sîpelên ji xwe bi  
hêztir de winda dibin û weha hêza xwe winda dilcin û ew sîpelên  
har û dijwar wan bi xwe re dibin û haya wan ji xwe nîne  
ka çi bela tê serê wan û lca ew di rastiyê de çî dikan. Ez bi  
bawer im ku berpirsyarê wê girupê mît e û bi zanebûn ketiye

102.

nav rêzên xebatkarên kurd di wê hêza siyasî de bona ku weha bike; kurdan li kurdan bike dijmin û kurdan bi destên kurdan bide kujtin. Lê aya gelo haya rêveberiya wê hêza siyasî ji vê çendê heye yan nîne!

Ji nijkan ve, pijtî nêzîkî saeteka birêveçûnê wî xortî ez rawestandim

û ez li bin siha darekê, li ber kaniyeka biçûk ya avê rûnijtandim û hewil da bi avê wê birîna ji ber jêkirina zimanî di devê min de çêbûyî paqij bike. Pajî li hemberî min rûnijt, temajayî min kir û got.

- Tu nizanî ka ji ber çi min xwe pêjniyar kir ku ez te bibim nêzîlcî qereqolê û ez yê kurd te yê kurd bi destên tirkan bidim kujtin?

Min bi hejandin serê xwe gotê na. Wî axînkeka kûr rahêla û dest pê lîcir çîroka xwe ji min re vegêra û got:

- Malbata me çûbû Ewropayê û li Elmanyayê bi cî bûbû.

Bavê min li wir li kargehekê ji xwe re kar dikir û danûstandinên wî bi partiyeka kurdî hebûn û dixwest li wê dûratiyê j

xelkê xwe re tijtekî, çend biçûk be jî bike. Ez jî bi egera wan

têkiliyên wî û tesîra hevalên di paitiya wî de, yên ku di jiyê

bavê min de bûn, hatim kijandin bo nav kar û xebata wê

partiyê. Min dizanî ka çi têt serê xelkê me, gund û bajar û

welatê me, li ser destên dagîrkeran. Min fehim dikir ka bindestî

çend giran û nexwej e û min dizanî divê, ji bo xwe rizgarkirinê

ji bin nîrê zordarî û dagîrkerinê qurbanî bêne dan û

min jerê çekdarî li dijî dewleteka ku axa welatê min dagîr dike

û xelkê min perîjan dike û çi zimanan ji bilî zimanê jerî



qebûl nake pejirand. Hêj ez 19 salî bûm ku ez bi rêya partiya xwe hatim vê derê. Ev pênc sal in ku ez jervan im. Ez pir bi jewq ketim nav vê xebatê. Ez bi jewqa hindê hatim vir ku li hember dagîrkerî rabiwestin û bergiriyê ji xelkê xwe, xweciyên welatê xwe, hevvelatîyên xwe bilcim. Ez bi hindê hatibûm perwerdekirin ku welatê me yek e û pirsar mafên nete-  
103

weyî yên her kurdekî li lçî derê be bila bibe ya me he'miyan e û divêt em hemî lê bi xwedî derbikevin. Lê hezkirin tijtek e û ya diqewime tijtekî din e. Salên pêjîyê çêtir bûn. Hîngê xebata me di piraniyê de li dijî dagîrkerî bû. Niha weha ne maye, nuke jerê me hatiye guhertin. Niha em kurd, ku hêj bindest in, jerê desthilata ku hêj ne ketiye di destên me de dikin. Em bûne leyistik di destên van dagîrkerên Kurdistanê de û li ciyê ku ew bihên û jerî li dijî me bilcin, me bi xwe lçij dilcine yekûdu, ew jerên xwe jî bi me dikin, me dikujin, ji nav dibin û welatê me wêran dikin û hêj em li bihaneyan digerin da ku jerên xwe yên navxweyî bidomînin û bi jerên rewa yên ji bo azadkirina milletî û rizgarkirina welatî bidin nas kirin.

Pijî bîstkeka bêdengiyê wî xortî dom da axaftina xwe û got:

- Ez êdî nikarim van tijtan qebûl bikim û ez nejê van dîtinên xwe rû bi rû bibêjim wan, wê çaxê ew dê min jî bikujin. Endamên partiyên me wekî mirîdên jêxa û terîqeyên wan lê hatine. Endam ji mirovîniyê ketine. Tijtê ku li serî têt gotin û ji serî têt ew bê yekûdu rast dibînin û erê dikin û bi çî tînin. Ew serên xwe bi lçar naînin û weha dibine amraz,

dibine robot. Bi endamên ji vî rengî partiyên me jî wekî xwe dimînin û bajtir lê nahên. Ev demek bû min kiribû dilê xwe ku dev ji vî rengê xebatê berbidin û min îro bi çêtirîn delîve dît, ku te jî xelas bikim. Ez bi xwe dê ber bi Sûriyeyê biçim û dê ji wir xwe bigihînim ve Elmanyayê û hêvîdar im ku rojek bihêt, tê de ev partiyên me dev ji van jer û pevketinên navxweyî yên bê wec û bê mane berbidin û xwe bi rastî bidin ber biserxistina têkojîna vî gelê bindest û perîjan û weha ji bo me jî rê vebibe ku em jî bi wan re li dijî dagîkeriya welat û xelkê me bixebitin. Umêdewar im endamên van partiyên me xwedî dîtin û helwêstên xwe bin û êdî nemînin sofî û kole-  
104

yên partî û kesan. Ez dev ji têkojîna xwe bernadim, lê ez dê li dijî van metodên jaj jî rabiwestim. Ya te, tu ji min re li ser vê lcazezê, kaxezek û qelemek dirêjî min kirin, binivîse ka tu dixwazî ber bi kî derê biçî.

Min jî nivîsand ku ez dixwazim vebigerim gundî. Wî got min ku nebaj e tu weha bikî ji ber ku ew dê bi te bizanin û dê te bikujin. Ew naxwazin çî bînerek, jahidek li ser kiryarên wan hebe û ya çêtir ew e, eger tu biçî jî, xwe li wê derê negirî û zû biçîye bajûrê welatî. Min jê re nivîsand ku ez dê bes biçim gundî jina xwe bibim û biçim bajûrê welatî.

Ew xort rabû ser pêyan û destên min vekirin û xatirê xwe ji min xwest û çend lîre û penqenot ji berîka xwe derxistin û kirin destên min û rêya vegeerê nîja min da û çû.

Min jî ew tiveng avêt û ew rê girt, lê xuya bû ku ez ji rêyê derketibûm bo ser rêyeka din û hema ji nijkan ve min xwe dît bi hêzeka çekdar ya lejkerî ve dormandorkirî. Wan bi tirkî

li min kir qêrî û ez dam ber qontaxên tivengên xwe û ez  
ajotim qereqolê û ji wir ez birim girtêgehekê û ez dam ber lêdan  
û êjandineka çend rojî ya pir dijwar. Pijî ku wan zanî ez  
lal im û ziman li min hatiye birîn, wan dev ji qutan û lêdanê  
berda û di dadgehekê de ku bi tirkî dihat axaftin û min hindî  
serê derzîkê jî tijtek jê fehim ne dikir, hulcmê heft salan  
zîndankirin li derheqê min hat dan. Di wê zîndanê de piranî  
kurd bûn û em hemî di destên polîsên zîndanê de pir perîjan  
bûbûn û tadariyên ku mirov bawer jê nake di wê zîndanê  
de li me dihatin kirin.

Çavên min, hizra min, ez bi hemî ve bes li benda wê rojê  
bûm, ku ji wir derbikevim û bihêmin nik te. Ew roj hat û ez  
hatim berdan û wan ez birim ser sinoran digel bajûrî û gotin  
min "de derbasî aliyê din be û neveger welatê me". Ez jî hindî  
wan ez didîtîm ber bi bajûr çûm û min pajî rûgeha xwe  
guhert û min berê xwe da vî gundî.

105

Ev deh roj bûn ez bi rê ve. Ez hatim gundî û kesê ez nas ne  
kirim û min tu dîtî bi zarokan ve mijûl dibî, dersan didî  
wan. Hindî dinyayekê kêfa min bi te û lcarê te yê dersdanê  
hat. Min guh li jinên gundî bû li ser kaniya avê ya nîva gundî  
qala te bi bajî dilcin û qala te û jûkirina te dilcin û min zanî  
ku hemî gundî pir hez ji te dikin. Min zanî jî ku Serdarê  
me heye.

Înîyekê ku tu ji xaniyê xwe derketî û ber bi çema çûyî, ez jî  
ketim pey te û min dît tu hatî ser wan qebran. Ez hîngê li  
bin wê darê rûnijtim û min li wê derê Serdarê me dît. O pijtî  
çûna we min temajayî goran kir û min zanî ku hûn ji min

bê hêvî bûbûn û we qebrek ji min re jî çêkir.

Ez di van hemî tijtan digehim û min bes dixwest bibêjim te ku min çend tu divêyî, min hind jî û bêtir divêt ku ev mala te damezrandî avatir û bi rewneqtir be. Tu jiyana xwe têk nede û mêr û xwezûrê te jî mirovên pir baj in û min her ev çîrok û ev dîtina xwe ji wan re nivîsandine û mêrê te ji xwezûrê te re xwend û ez dizanim ku ew têdigehin ka rewj çawa ye û ka ji ber çî min xwest ez te bibînim.

Min biryara xwe daye ku biçim bajûrê welatî, li wir bi cî bibim, lê ez dê carûbaran bêm seredana we û hindî ji destên min bihêt ez dê arîkariya we jî, di warê madî de bikim. Ez, ku xelkek hêve were, dê kaxezkan bo te bijînim û dê ji te re bêjim ka ez li kî derê me û ka ez çî dikim. Êdî Çinar çarenivîsa me weha lê hat û her çend e dijwar e lê divêt em xwe li gor vê rewja xwe ya nû pêk bînin û jiyana xwe bidomînin." Pijtî ku Serdarî axaftina xwe xelas kirî, careka din hêl Serdarê biçûk himbêz kir û rabû ser pêyan û xatirê xwe ji herduyan xwest û derket û Çinar ma li ciyê xwe rûnijtî, kaxez di destan de û Serdarê biçûk bi dêm û navçavên xwe yên hijtî Serdarê mezin li hindav serê wê. Wê himbêzên xwe vekirin û Serdarê biçûk xwe di dayika xwe werkir û herduyan

106

yekûdu girt û himbêz kir û giriyan.

Dema Serdar ji odeyê derketî û xwestî xatirê xwe ji xwezûr û mêrê Çinarê, yên ku çend metran dûrî xaniyê rawestiyabûn, bixwaze, mêrê Çinarê destê wî girt û ew bi xwe re kêja bo aliyekî û temaja kir Serdarî û gotê:

- Bersiva min bi serê xwe li ser pirsyara min bide: Tu hêj

hez ji Çinarê dikî û tu dixwazî ku ew bi te re bihêt?

Serdarî bawer ji guhên xwe ne kir û ne xwest derewa bike û bi erê serê xwe hejand. Evca mêrê Çinarê gotê:

- Eger Çinar jî bixwaze û ez dizanim jî ku ew hêj hez ji te dike, wê bi xwe re bibe. Rast e em gundî ne û tijtên weha li cem me ne qewimîne, lê ez naxwazim ku min jinek hebe û hez ji min neke û dilê wê li pey yekî din be. Ez naxwazim heta hetayê bi wijdanekî nerehet bijîm. Min niha ev pirs bo bavê xwe jî got û min ew qayil kiriye ku ew her niha biçê cem melayê gundî û her îro, ku Çinarê viya, ez û ew hevûdu berbidin. Wê çaxê bi jerîeta Xudê û pêxemberî ew ji te re helal dibe û dikare bibe jina te û digel te biçê bajûrê welatî. Di wê gavê de qêriyek ji odeya ku Çinar tê de bû hat, dengê Çinarê bû, bang dike:

- Serdar, raweste, me bi tenê nehêle, Serdar.

O digel wî dengê xwe ew bi xwe jî, ji odayê derket û destê Serdarê biçûk di destê wê yê rastê de û heçku dixwest li pey Serdarê mezin bibeze û bigeheyê. Lê dema li derveyê odayê çavên wê bi mêrî û Serdarî û xwezûrî ketin, ew di cî de rawestiya û ji jerman de serê xwe jor kir. Serdarê biçûk xwe ji destê dayika xwe veresand û ber bi Serdarê mezin bezî û xwe di lingên wî werkir û gotê: - Bavo me nehêle.

Ew peyva bavo ku wî bo cara yekemîn dibihîst ku kesek pê gazî wî dike, ew ji kulovanka serî heta pehniya pêyan veciniqand. Wî xwe nizim kir û Serdarê biçûk bi kel û ejqeka bê sinor û mezin himbêz kir û bilnd lçir bo ber sîngê xwe.

107

Wê nabeynê xwezûrê Çinarê ji wê derê ber bi nava gundî

çû. Mêrê wê jî ji ciyê xwe livî û li hember wê rawestiya. Wê ji nû serê xwe bilind kir, lê nikarîbû çavên xwe biêxe ser çavên wî, wê jerim ji wê reftara xwe dilcir. Mêrî gotê:

- Çinar, pêwîstî bi jermê nîne. Wê ha bavê min çû pey melayî. Ez dê te berbidim bona ku tu bikarî bi mêrê xwe yê berê re biçî, bo ku Serdarê biçûk jî bikaribe bi bavê xwe re bimîne. Ez dizanim tu jî wê dixwazî û ev çend sal in tu li benda vê rojê yî, lê bes bo ku ez gotina te jî li ser vê çendê bizanim, ji kerema xwe bersivê li ser pirsyara min bide: tu jî dixwazî em weha bilcin ku tu bi Serdarê mezin re biçî? Tu dixwazî ez te ber bidim bo ku tu bibî jina Serdarê mezin? Te digot qey wê gavê, mêrê wê hemî dinya lçiriye destên xwe û pêjkêjî wê kiriye. Gotin ji devê wê ne dihat, ji kêfan de rondik ji çavên wê barîn û ne dikarî li ber wî mirovê mezin yê li hember wê rawestiyayî li benda bersivê baj çavên xwe jî rabike. Dixwaset wê gavê xwe di wî wer bike û wî li ser wê reftara wî maçî bike, lê jermê ne hijt ku ew weha bike. Wê bi erêyê serê xwe hejand.

Her wê jevê pijtî ku Serdarê mezin serê xwe jûjtî û kincine mêrê Çinarê li xwe lçirin, her wê jevê Çinar li ser destê melayê gundî hat berdan û her di eynî gavê de jî, her li ser destê eynî melayî bû jina Serdarê xwe.

Roja pajtirê, be xwe girtin, wan berê xwe da bajûrê welatî. Di rêya vegeerê de ew tûjî xalê Çinarê bûn ku ji bajûrî hatibû pey Çinarê, pijtî ku zanîbû lca ew li kîj gundî ye, da ku wê bibe cem xwe. Hemî çûn ser û stûyên yekûdu û ew pêk ve, bi dilên xweş û bi kêfli ser rêya xwe berdewam bûn. O ji nava geliyekî dengê stiranekê hat û Serdarî dengê Saloyî jê nas

kir dibêje:

"Heylo birawo

108

de binêre ka van bê hij û nezanên gundê me çi anî serê te  
ûmeûxwe,

de rabe temaja bike vê kelexistanê, vê mirinistan û kavilstanê,  
de rabe vê xemistana me bike lavje û bilorîne.

Heylo Dildarê mino,

dayik û bavê mino,

tu xortê xortan bûyî,

tu zavayê ber dilê bûkê bûyî.

Heylo birawo te dît çawa mejîrejî û nefamiya mirovan çi  
tîne serê wan,

te dît çawa fitne hilbû û gundiyan her bi destên xwe agir  
berda mala me û mala xwe,

û kêfa neyar û nehezan anî bi me û xwe.

Hey lo birawo, heta nuke jî kwîxe û mezinên me bo jexsên  
xwe,

bo nav û xwejiya xwe, bila ziyana me hemiyan jî tê de be,  
nokeriyê bo neyaran dilcin,

serjoriyê bo dagîrkeran dikin "

109

"wê periya ji ciwanîyê tîrhavêj, dêmê wê yê

gilovir yê wekî heyva geş ya çardeşevî, hinarokên

rûçikên wê yên sor û spî, wan reşçavên

mezin û mestker, wê bejna dirêj û navtenga zirav,

wê şepalê, şoxê, dilê Serdarî bi çavdîtina

yekemîn dagîr kir."

Ji romanê

\*\*

## FEQIYÊ TEYRAN

ABDUSAMET YÎGÎT

Weşanên Sara'yê

FEQIYÊ TEYRAN -I- ABDUSAMET YÎGÎT - Roman.Sala li çapdanê 2009, Stockholm, Swêd. Mafê berhemê: Abdusamet Yîgît & Weşanxana SARA'yê. Wêneya bergê: Kincên Peyayên Kurd 1885 (Antique Ethnographic Print: Kurdish Men and Costumes of Kurdistan - 1885).

Weşanên SARA'yê

FOUNDATION FOR KURDISH LIBRARY & MUSEUM

Dalag. 48

S-113 24 Stockholm SWEDEN

info@saradistribution.com

ISBN 978 91 87662-55-8

PÊŞGOTINA WEŞANXANÊ

Abdusamet Yîgît sala 1978'ê li gundê Xirabesosinê ku di navbera Cizîra Bota û Nisêbinê de ye, ji dayik dibe. Biçûkatiya xwe li wir dibuhurîne. Ta ku dibe 10 salî, li gund dimîne. Pişt re, ji ber hatina dewletê bi ser şênîyê, ew bar dikin bajêr. Dema ku ji gund bar dikin, pêşî diçin gundekî, ku jê re dibêjin Selekunê. Ji wir re Seregir jî têt gotin. Li Selekunê jî derfet na din malbatê, ku li wir bimînin. Yê ku bi wan re bar kiri bûn, nêzîkê 50 mal bûn, hemû jî malên mam û biraziyan bûn. Piştî ku weke 5 yan jî 6 mehan li Selekunê man, tevde barê Midyadê kirin. Li Midyadê malên wan tev bi cih bûn. Piştî bi cih dibin, dewlet dîsan bela xwe ji wan na veke. Vêca ji Midyadê barê Estîlê dikin. Li wir Samet temenê xwe yê xwandinê hilda û gav



avête nav salên xwe yê ciwantiyê. Lê belê dewlet li wir jî hate ser bavê Samet û ew êdî carek din jî, ji ciyê xwe hatin rakirin û ji wir jî bar kirin. Mamê Samet yekî serxwe bû û bandûreke wî li ser xelkê hebû. Dewlet jî dixwast, ku vê hebûna wî bi kar bihêne. Ew jî li hevberê vê rabû. Sal 1987 bû. Di wê demê de, dewlet dixwast ku cerdevaniyê pêş bixe. Ew li hevberê vê yekê bûn. Têkiliya wan bi têkoşîna azadiya kurdan hebû. Li Midyadê, ew ta sala 1991'ê man. Pişt re ji ber terora dewletê, bêgav man ku Kurdistanê bi yekcarî bi cih bihêlin û barê Mêrsînê bikin. Di wê demê de jî, li gund û li ciyên din çend mal û sermiyanê wan ku hebûn, dewlet tev dest da ser de û tev da ew gundê ku li ber gundê wan bû û navê wî gundê Alaqamsê bû. Ev gund tev cerdevan bûn.

Samet li Serhedê hat girtin. Dewlet dizani bû, ku têkiliya Samet bi têkoşînê re heye. Ji ber vê yekê jî, gava ku ew girtin, 17 rojan di bin çavan de hiştin û pişt re jî, ew şandin girtîgeha Îdirê. Li girtîgeha Îdirê 47 rojan ma bi 40 hevalên xwe re. Paşê ew tev hev şandin girtîgeha Erzeromê. Di wê demê de li girtîgeha Erzeromê dema wehşetê bû. Samet li 5'ê Çiriya Yekem 1994'ê têt girtin. Piştî 47 rojan, girtîgeha Îdirê, 22 mehan li girtîgeha Erzeromê dimîne. Ji endametiya rêxistinê, di DGM'ê de têt darizandin. Piştî ku derket, bi çendî sê mehan careke din hat girtin. Vê carê jî li Êlihê hat girtin. Li wir, cara ku ser 10 rojan di bin çavan de hat hiştin û pê de, ew şandin girtîgehê. Bi çendî salakê li hundir ma. Di wê demê de li DGM'ê li Amedê hat darizandin. Li dadgahê 12 sal û nîv ceza jê re xwastin û dan. Piştî ku ceza dane wî, êdî ew şandin girtîgeha Gîresûnê. Li vê girtîgehê 8 salan ma. Piştî heşt salan, sala 2004'ê, 27 salî, ji girtîgehê derket. Samet têkoşîna xwe ya ji bo azadiya kurdan hîna jî didomîne.

Samet bi vê meşqkirin û vegotina hizrî, ya li ser klasîkvanekî me yê fireh navdar, li ser jiyana Feqiyê Teyran; vegotineke serguzarî (roman), wêjeyî, derûnî, ya têra xwe zindî û rengîn dihone.

21.3.2009

## F E Q I Y Ê T E Y R A N

I

Rojek wek ji wan rojên din bû. Lê li hewa serma hebû û ev serma jî bi xwe re seqemeke pir hişk ji derve dihanî. Bi wê seqema serê sibehê re, Hasnê jî zû rabû bû ser xwe û kar û barê xwe yê malê dikir. Mêrê wê Hamed Beg jî, dereng ji xew rabû bû û li ser taştê rûnişti bû, taştiya xwe dixwar. Hasnê berî wî ji ser taştê rabû bû ser xwe, ji bo kar û barê xwe hinekê zûtir pêk bihêne. Hamed Beg taştiya xwe kir, rabû û çû li ber dîwarê malê, li ber germahiya beroşkê rawestiya. Ew germahiya ku ji royê derdiket, germahiyeke xweş dida û ew germahî jî, wê seqema hişk a sibehê dişikand. Derdor germ dibû û bi germê re jî, di wê heyamê de, hewa hinek xweş dibû. Hasnê ne dikarî pir bi karên giran rabe. Karên ku dikari bû bike, dikir. Hasnê zikê wê li ber devê wê bû. Ducanî bû. Di demeke nêzik de wê zarokek jê re çê bûya. Ew jî ji ber vê yekê dilxweş û bidil bû. Ew zarokê wan ê pêşî bû.

Berî ku begê wan ê mazin ji aliyê osmaniyan ve fermana mirinê jê re were dayin, jin hanî bû. Piştî ferman jê re derketi bû, ji wir çû bû. Lê çi kesekî ni zani bû ka ew çûye ku derê, yan jî nuha li ku derê dimîne. Lê bêguman hê sax bû. Ji ber ku hê nûçeya mirina wî ji maliyên wî re ne hati bû. Heger mirî ba, yan jî leşkerên osmaniyan li ciyekê xwe gihandibanê, wê nûçe zû belav bibûya. Begê mazin diçe, li nig Mîr Mihemed Mîrê Bazîdê xwe dide alî. Mirê Bazîdê mîrekî pir baş û bi qenciya xwe jî fireh dihate naskirin. Beg û axayên

li derdorên Agriyê (Araratê) jî gelekî rêz didane wî û li gorî gotin û lebatên wî gavên xwe diavêtin. Ji ber vê yekê, rezê Şêxê Îdirê jî, ji wî re hê mazintir dibû.

Hasnê jineka pir baş û yeka zîrek bû. Li nav civakê û li derdora xwe dihate naskirin. Hasnê Xatunê, qîza begê Miksê bû. Begê Miksê jî li derdorên herêma Colemergê bi nav û deng bû. Colemerg di wê demê de heremeke gelekî bi nav û deng bû. Piştî şerê ku li herêmê ku di nav wan û osmaniyan de bû bû, êdi hê bêhtir bala sultanên osmaniyan kişandi bû ser xwe. Hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku piştî şerê dema wan, dewleta osmanî li herêmê, di bin navê 'rastkirinê' de gelek guherandin dabûn çêkirin. Weke begê Miksê yên gelek herêmên din jî, bextên wan bû bû wek hev. Lê ji aliyê rêveberiyê ve, ya serketî dewleta osmanî bû. Bi hêzeke mazin xwe bi ser xisti bûn. Bi wan serketinan re, li herêmê û bi begên herêmê re jî gelek guharandin bi xwe re hanî bûn. Piştî seferên bi wan şeran re, gava ku sultanê osmaniyan sefera li Kurdistanê hê mazitir dike, êdi wan guherandinan tevî gelek xirakirin û perçiqandinan dest pê dikin û berdewam dikin.

Begê Miksê jî, bi vî awayî ji herêmê têt revandin. Lê lingê wî ji herêma wî na be, ku here herêmeke din û dûr be. Li herêma xwe dimîne, ta ku kal dibe. Kurê wî Hemed Beg jî di wê heyamê de bi awayekî xwezayî cihê wî digire. Gelê Miksê piştî begê xwe û malbata wî digirin û na berdîn bi tenê. Ji ber vê yekê jî, Hemed Beg li wir dimîne. Ji aliyekî dî ve jî, dewleta osmanî pir ne diwêrî bû, ku here ser wî. Piştî ku beg ji herêmê çû, ji ber ku di nav civakê de têt jimartin, ku beg ne li malê be û hêriş here ser mala wî, wê beg û axayên herêmê jî, li hevberê vê yekê serî rakin û ev yek, ji bo osmaniyan hîç jî ne baş dibû. Di nav civakê de, her weha weke

kevneşopiyeke xwezayî jî, li malbatê xwedîderketin hebû. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku mala ku hêza xwe winda kiri bin, lêxwedîderketin weke kevneşopiyeke xwezayî bû. Ji her herêman lê xwedî diderketin û lê dimeyizandin di nav civakê de. Ji ber vê yekê jî rêvebirên osmaniyan ku hatiba, diviya bû pêşî bi serekan re rûnişt, yan jî wan bikişînin nig xwe daku xwe bi ser xin. Ku dihatin jî, yê ku pêşî dikirin ev bû. Şêx û axa û begên herêman, her weha hem jî aliyê mirovên herêman ve, weke ewlekariyeke bi kar dihatin û hem jî, ji aliyê rêveberiya osmaniyan ve ji bo ku nêzikî mirovan bin ew dikişandin bi aliyê xwe de û ew bi kar dihanîn. Lê osmaniyan ev yek di bin navê nêzikatiyeke olîtiyê de dikirin. Dema ku beg çû bû, pişt re Hemed Beg jî bû bû weke begê Miksê. Bavê wî ji bavkalê wî senceqa ku osmanî dabûnê, ji dest girti bû û ta wê roja jiyana xwe bi awayekî xwezayî berdewam kiri bûn. Beg û axayên herêmê, xwe li gorî jiyana û kevneşopiyên xwe berdewam dikirin. Osmanî dixwastin li gorî nêzikatiyên wan were berdewamkirin. Di nav wan her du nêzikatiyan de, serekî xwezayî ku di nav herêmê û osmaniyan de li ser wan nêzikatiyên bingehîn, ku bi hizrî û civaknasiyê jî dihate ser zimên û xwe di nav wan de didan berdewamkirin.

Hizra civaknasiya Kurdistanê, xwe bi xwezayê re bi wate dike. Ev xwezayetî ji aliyê nêzikatiyên civakî ve jî, her weha xwe bi wate dike. Li hevberên wan rawestan jî, bi vî awayî dibû dîrketina civakî. Li gor vê yekê ku mirov dihizire, mirov dibîne ku şerên dijwar ku bi kuştinên koman re berdewam kiriye. Her weha dîrokek bi xwîn hatiye nivîsîn.

Li Miksê jî ev yek pir bi wate bû. Ava Wanê hinekî ev wate mazintir dikir. Herêm piştî dema ûrartûyan, ta wê demê, her weha

ji bo hebûnên xwe rastî hêrişan hatine. Ji ber gelek hêrişan, xwe spartine wê derê. Lê çûna ser wê derê jî hinekî bi dijwarî dibû, ji ber ku mirovên ku xwe spartine wê derê, ji êlên (eşîrên, hozên) wê çûbûn ser wan. Wê çaxê çûne ser wan kesan û li nav hêrişên êlan de mane. Ev yek ji bo artêşê têkçûneke mazin bi xwe re haniye. Osmanî jî ev yek ji ber çavan ne dihildan. Her weha kevneşopî ji parastina mirovan re dibû şargeheke mazin. Li hundirê Wanê yan jî li aliyên din, li navendê jî, filehan, di nav dêran de hinek cihên veşartinê çê kiri bûn. Wan ciyan jî di bin hêrişan de dihatin bi karhanîn.

Li Miksê, ji gelek aliyên ve jî, cihên ewlekariyê çê kiri bûn. Ev cih mazin û di zikê xwezayê de hati bûn çêkirin. Cihên ku ji bo ewlekariyê hati bûn çêkirin, li dêrên weke Miksê, weke nêzîkê cihên daristanan û hwd dihatine çêkirin, daku di tengasiyekê de xwe bigehênine hundurê wê derê. Ku xwe digihandine daristanê, ji çiyayê Sîpan û pişt re Agirî ji bo wan dibû cihekî ewletiyê. Ji êla Hemed Beg jî gelek kesên weha di rewşên dijwar de xwe digihandine ciyan û rizgar dibûn.

Hemed Beg piştî xwarina xwe xwar û hate ber wê tîna rojê, ku zû serê sibehan derdikeve. Serê sibehê ew tîn pir xweş e û li ser mirov hîkariyekî (tesîreke) pir xweş dike. Hasnê jî pir bi kar ve na mîne ji ber ku ni kari bû pir kar bike. Karê ku kari ba dikir, ê ku ne kari ba jî dihişt ji yên ku dikirin re. Lê piranî karê mala xwe wê dixwast bi xwe bike û dikir. Ku jê dihat, çî caran bi hêviya çî kesekî ve karê xwe ne dihişt. Her weha karê xwe jî, xwe bi xwe kirin jî, tiştê ku herî zêde jê hez dikir. Hamed Beg jî, ji ber ku kurê beg bû û her dem mirovên ku dihatine dora wî, di nav wan de dima. Lê piştî ku begê mazin çûbû, êdi zêde civata wan ne digihaşt hev. Piranî jî,

Hemed Beg dema xwe bi Hasnê re li malê dibuhurand. Lê car bi car jî, jin li hev digihan û bi hev re dipeyvîn û li ser mijarên di nav xwe de dan û standinan dikirin. Ji aliyek din ve jî, Hasnê bi tenê ne dima ji ber ku ducanî bû. Ha wê zarokê wê bibûna û ha wê zarokê wê bibûna. Li ser lingan bû. Lê ew jî û Hemed Beg jî pir lihev bûn. Zarokê wan yê pêşî wê çê bibûna. Lê begê wan ê mazin ne li nig wan bû. Bêguman vê yekê jî li ser wan hîkariyê dikir. Lê ne dibû asteng ji dilxweşiya wan re, ku wê zarokê wan çêbe. Di nav jiyana xwe de bi xwezayî tevdigeriyan. Ma gelo wê keç çê bibûna yan jî kur? Ew yek jî weke meraqek di dilê wan de bû. Ma wan çi dixwest? Keçik yan jî kurik? Tenê weke meraqek di serê wan de hebû û her wekî din, ji wê pê de çi tiştê wê kêlikê di ser xwe de ne dihizirîn. Tenê dikirin ku rojek berê zarokê wan were dunyayê, ku bêguman wê pir bi nirx û hêjayî be ji dê û bavê xwe re. Tenê car bi car ku Hasnê dirûnişt an jî bi tenê dima, destên xwe datanî li ser zikê xwe, dibir û dihanî. Bi kêf û bi dil jî li zikê xwe dimeyizand. Ma gelo çi di zikê wê de hebû? Keç bû yan jî kur? Ew jî pir bi meraq bû. Wê kêlikê gelekî dixwest fêr bibe, ka bi wê re keç e yan jî kur? Lê ne dibû ku wê kêlikê vê fêr bibûya. Divêt ta ku zarokê wê bibûna di vê nezaniyê de bima. Zarokê wan yê pêşî bû ku wê were dunyayê. Ew yek jî pê re dibû sedema hinek dilperîn û bêtebatîyan. Lê ji neçarî diviya bû, li ber hatina roja xwe bima. Ji neçarî bû ku ni kari bûn fêr bibûna ma ka kur e yan jî keç? Yan jî ni kari bû berî dema xwe tijî bike, ku were dunyayê. Ji wê aliyê ve, tiştê di destê wê de tune bû. Lê pir bi dil û bi xweşî li hêviya wê roja ji dayikbûna zarokê xwe rawestiya bû. Her weha weke wê, Hemed Beg jî li hêviya çêbûna zarokê bû. Hemed Beg jî wê cara pêşî bibûya bav. Ji wî aliyê ve jî, hinek meraq û dilxweşî pê re hebûn. Ma gelo ew hesta ku ji nûka ve bibûya bav,

ku xwe pê re dide nîşandan, çawa bû? Çi di dilê wî de çê dikir? Yan jî bavîtî çawa bû? Hemed Beg jî wê bibûna bavekî çawa gelo? Her weha bi wî re jî gelek pirsên ku bersiva wan ni zani bû, di serê wî de bûn. Tenê ev pirs di serê wî de bûn, lê wê di demeke nêzik de bersiva van pirsan bihata. Pir carên ku li hewşê yan jî li hundurû ku digehîştin hev, bi xweşî li hev dimeyizandin û bi hev re bi dilxweşî dikenyan û paşê di hevdu re dibuhurtin.

Her weha dilxweşiyêke pir mazin bi herduyan re jî xwe dida xuyakirin. Hasnê wê bubûya dayik û Hemed Beg wê bibûya bav. Ev hizir di serên herduyan de ji hebû. Hasnê û Hemed Beg bi hezkirina hev, hevdu mar kiri bûn. Ji ber wê yekê jî pir hez ji hevdu dikirin. Hezkirineka mazin di dilê wan de ji bo hevdu hebû. Ev hezkirin bû ku wan ev çend bi hev re ji bo bûna zarokê wan bi hêvî û bi dil kiri bû. Bi wê hezkirinê re di dilên xwe de, bi hev re li zarokê xwe dimeyizandin. Ev hest bi wan re hebû, lê ma gelo wan ev hest çawa yan jî bi çi awayî dihanîn ser zimên? Mirov li ruyên wan dimeyizand, dihat têgehîştin, ku bi hestbûn û rûfihêtî di nav hev de li ruyên wan dixist û bi ruyên wan re dida derve. Lê bêguman divêt mirov bêje ku şahiyek di dilên herduyan de hebû, ku wan bi xwe vê jî bi temamî ni kari bûn bihênine ser zimên. Tenê vê dijiyan. Hemed Beg bav bû ji ber vê yekê kî dizane dibit, ku di dilê xwe de, weke xwe, kur jî dixwast. Lê tiştê ne dida derve. Heger kur be, wê weke wî bibe beg li ser serê herêmê, wê navê wan welê berdewam bike. Lê bi wê bavbûnê re tenê bûyina bavîtîyê di serî de cih girti bû. Carinan kur çê dibûn an jî keç. Lê gava ku mirov ji axatîyê be yan jî begîtî, bêguman her weha dixwaze weke wî jiyanek bi tuxmê wî re li pey wî re jî berdewam bike. Ev xwestek, xwestekeke asayî ye. Lê ji bo mirovekî ku hez kiri be û her weha evîndarê xwe hanî be, ma gelo

ev asayî ye? Ma evîndarî ne xwezayî ye, ku bi hev re li gotinekê yan jî li ser biryarekê ku bi hev re were girtinê? Ma ew bi hev re xwedî gotin bûn? Ma gelo hizra Hasnê çi bû di vê xalê de? Ew jî jin bû û bêguman ew jî, ku mirov li gora wê mentiqê (lojîk) bihizire divêt, ku mirov bêje ew jî bi awayekî din dixwaze. Mirovên mazin bin û di nav civakê de xwedî biryar û gotin bin, her weha li ser xalên bi vî awayî re jî, bi taybetiyên xwe re, xwe didin nasandin. Mazinbûn û evîndarî her weha di rêveberiyê de bi nakokiyên kesayetiyê (şexsiyetê) re xwe dide nasandin. Lê bêguman divêt mirov bêje ku ev nakokî her weha bi vî awayî, di dilên ew kesên ku hevberên hev in, êşê jî çê dike. Ji ber ku evîndarî û mazinbûn di kesayetiyê de, di ser de ye di wê kêlîkê de. Hasnê jin bû û ku mirov li gor vê yekê dihizirî, mirov didît ku nêzîkatîyeke her weha ku hebe, wê gelekî êş pê re çêbe. Dilên tenik ji evîndariyê re hene. Lê dilên tenik jî, bi pirhestên di dil de ne. Pirhestbûn jî, ji aliyê hestan ve be, yan ji hizir be, rûniştinekê dixwaze di kesayetiyê de. Ji ber ku bi hestan re hevdîtin û bi hestan tevgerîn û li ser ve tevgerînê jiyaneke hestiyar avakirin bi xwe re hizrên hestiyarî jî çêdike û dike di bingeha wê jiyane de.

Lê gelek caran, ji hestiyariya mazinbûnê, ji aliyê hizir ve jî tenê, bi xwe re bi hêza xwe re ye. Ji ber ku hestiyarî di piralîyan de wekhevî û xwedîtiyê dixwaze. Ev gotin weke gotineke bi nakokî jî were xuyakirin, lê disan divêt mirov bêje ku di sazimendiyê de taybetiyên kesayetiyê dihêne ser zimên. Ev kesayetî ji kesayetiya evîndariyê ye. Kesayetiya evîndariyê gelekî bi hestan re dijî. Ji ber wê yekê têt gotin ku carina ne bi çavekê, lê bi çavikekê dimeyzîne. Hasnê û Hemed Beg jî gelo bi vê çavikê bûn? Jiyana wan di nav wan de di xwezaya xwe de berdewam dikir. Piştî ku begê mazin çûbû, dîsan weke berê di xwezaya xwe de jiyana wan berdewam dikir.



Hev bi evîndarî kiri bûn û nuha wê ji wan re zarokek çê bûya. Wê bibûna dê û bav li jiyane. Bi dê- û bavbûnê re, wê gelek berpirsiyariyên wan çê bibûna. Ji vê yekê re jî diviya bû xwe amade bikin. Jiyana û rêveçûnên wan dihate meyzandinê. Ji aliyê vê berpirsiyariyê ve, ku mirov dimeyzand diviya bû, ku mirov bêje ku berpirsiyariya jinê li jiyane hê bêhtir bû. Lihevdayina malê û sexbêrî û meyzandina li zarokan, li ser milê jinê bû. Biryarên malê jî bi piranî wê didan. Li malê gotinên jinê divêt ku ne hata binpêkirin. Li malê gotina peya jî dibuhurî û mazin bû. Lê ma gelo bi qasî ku gotina jin li malê dibuhurî, ya peya jî li derve dibuhurî? Lê dîsan divêt ku mirov bêje ku bi hevrebûn mijareke gelekî girîng bû û xwe dida ber çavan.

Hasnê li malê bi kar û barên malê re pir jêhatî bû. Gava karê xwe hew dikir, di odeya xwe de bi tenê dima, di bedengiyê de bû. Car bi car Hemed Beg diçû nig wê dirûnişt û ew bi hev re li ser tiştên ku dihate hişê wan dipeyvîn. Lê ev yek ne berdewamî bû. Ku dihatin nig hevdu, ji xwe re bi hev re diketine di nav peyivtina de. Hemed Beg jî di wê demê de ne dixwast wê bi tenê bihêle, ji ber ku li ber bû, ku jê re zarok çê be. Car bi car êş dihatine wê, lê dîsan di cih de dibuhurîn. Wê jî car bi car ku bi tenê bi hev re diman, ji begê xwe re digot 'Ha dem e, ew ê bibe, ha dem e..' Wan jî li hêviya wê dema bûna zarok bûn. Kanê wê kengî bihata? Di nav malê de jinên din jî hebûn ji ber vê yekê di wê rewşê de zêde kar bi wê ne dihate kirin. Ji aliyê dî ve jî, xatûna beg bû û nû bû. Ev yek jî ji wê re dibû weke sedemekê, ku di wê rewşa ducanbûna wê de, pir kar pê ne hatiba kirin. Bi tenê dima, di cih de dihate nav mezelê xwe de û têde dirûnişt. Rojên wê wisan derbas dibûn.

Piştî heyvekê Hasnê dikeve nav ciyan û jê re kurikek çê dibe. Bi hatina kurê wan, gelekî dilxweş bû bûn. Navê wî danî bûn Mihemed. Navê bavê dayika wî ji Mihemed bû. Piştî ku Mihemed hati bû dunyayê, jiyana wan pir hati bû guherandin. Beg jî û dayika wî jî êdî dema xwe di odeya xwe de, bi Mihemed re dibuhurandin. Hêdî hêdî ku mazin dibû, hê bêhtir dikete di ber çavan de. Dem zû diçû, lê bi wan re li nig kurê xwe ni zani bûn ku dema wan çawan diçû. Bêguman, dema wan zû diçû. Mihemed ku bû pênc salî, gelekî di dilên mirovan de cih girti bû. Kesên ku ew didîtin gelekî hez jê dikirin. Ji aliyê jîrbûnê ve jî, çavên kesên ku lê dimeyizandin, dadigirt. Mazinbûna bi serxwebûn di nav hevalên wî de, di têgehîştinê de wî fikir xwediyê serweriyeke mazin. Gotinên wî di nav hevalên wî de dihatine hesandin. Bi vê yekê re, ji aliyê xwe ve bi hevalên xwe re û her weha bi kesên li derdora xwe re, xwe dabû erêkirin. Zaroyên ku hê biçûk be û ev çend di nav hawîrdora xwe, heval û mazinên xwe de, xwe dabe erêkirin, di nav civakê de weke teybetiyên zanebûn û jîrebûnê dihatine dîtin. Zanebûn û jîrebûn li gavavatinên wî bi meyizandinê re dihate şirovekirin.

Heft salî dest bi perwedeya xwe ya bingehîn dike. Ji aliyê xwandinê ve bavê wî jî guhên xwe baş didayê. Li nig seydayan dest bi xwandina xwe kirinê re, jiyaneke nû ji bo wî dest pê dike. Seydayên ku baş û têr bi zanebûn bûn û ji aliyê zanebûna xwe ve bi nav û deng bûn, dest bi fêrdayina wî kirin. Ji aliyê mazinbûna mala bavê wî jê re dibû alîkar. Her weha mazinbûn jê re di vê rewşê de hê bêhtir xwedîderketinê bi xwe re dihanî. Bêguman di vir de divêt mirov bibêje, ku ji aliyê zû fêrbûnê ve jîrbûn, li ber çavan wî derdixiste pêş. Zûtêgehîştin û hildana serî jî, her weha dibû bingeha hatina ber çavan û ketina çavan ji bo wî. Çend ji aliyê derfetên

mazin, ji aliyê mazinbûna malbatê ve jî, jê re bihata nîşandan jî, ku ew bi xwe re ne jîrek bûna, wê gavê jî, wî mazinbûnê jî alikarî ne didayê. Tenê wê jê re bibûna bingehek xwejiyandinê. Lê Mihemed derfetên bingeha xwandina xwe kiri bûn. Mihemed weke yekî pir jîr di nav xelkê de û hawîrdorên xwe de dihata naskirin. Mirov ji biçûkatiyê ve, hinek bi taybetmendên xwe kifş dibe. Yan jî rewş û mercên ku têde ye, vê yekê hinekî dide xuyakirin. Xuyabûna wî ji aliyê taybetmendên wî ve, xwe dide ber çavan de. Di vir de divêt ku mirov bêje, ku dayika Mihemed pir jê re dibû alîkar. Wê ji perwerda xwe hilda bû. Zani bû pir baş bixwîne û binivîse. Di biçûkatiya Mihemed de, her dem ji aliyê fêrbûnê ve, li nig wî bû. Berî ku dest bi xwandina li nig seydayê xwe bike, dayika wî jî dest bi fêrkirina wî kiri bû. Dayika wî jî, jê re bû bû weke seydayekê di wê demê de. Fêrên ku li nig seyda dihatine xwandin, pişt re li malê li nig dayika xwe, bi alikariya wê hê bêhtir dida meşq û ravekirin. Her fêrekê ku baş meşq û rave dikir jî, hê bêhtir ji wî re dibû bingehek mazin. Meşq û ravekirin di zanebûn û fêrbûnê de gelekî girîng e û bingeha pêşketinê çê dike. Mihemed ji vî aliyê ve jî ku dihate şirovekirin, dihata ditin, ku xwediyê pir seydayên baş bû. Hezkirina dayika wî her weha weke fêrbûneke xwe jê re dida nîşandan. Li ser fêrekê ku baş hatî meşq û ravekirin re buhurtina fêra ser din, bi xwe re zanebûneke mazin dihanî. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku mirov bibêje ku nêzîkatiya bavê wî jî, pir girîng bû ji wî re. Bavê wî bi xwe re ew dibir di nav civatê de dida rûniştandin. Di nav civatan de li gotin û stranan bi mazinên xwe re dihesand. Her weha di nav civatê de hesandin jê re dibû weke bingehekî ji aliyê naskirin û fêrbûnê ve. Mirovên zane û dengbêjên di nav civatan de, dihatin nig hevdu û di nav civatan de zanebûn û hizrên xwe dihanîne ser zimên. Xelk li

hevdu dihesand, hizir û ramanên hevdu fahm dikirin û ji hizir û ramanên hevdu encam derdixistin. Ji gelek aliyan ve jî, di civatan de hevdu bi her awayî nas jî dikirin. Gotinên ku di nav civatan de dihatine ser zimên jî, zû bi zû ne dihatine jibîrkirin. Di mejiyan de diman. Ji ber ku bi nimûneyên weke çîrok û vebêjên jiyana mazinan dihate ser zimên. Piranî ev çîrok û vebêj jî, bi gotinên civakî û hizrên wê dihate afirandin û ser zimên. Her weha Mihemed jî gelek tiştên ku di nav civatan de dihatine ser zimên, di serê xwe de bi cih dikir. Bi vî awayî li nig seyda ferbûn û di nav civatan de naskirina wî bêhtir dikir.

Mihemed her weha ji gelek aliyan ve dibû xwedî zanebûnên di nav civatê de. Di vê xalê de hêjayê gotinê ye, ku divêt ew ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, pir zane bû. Bêguman yekî ku ji aliyê vegotin û vebêjînê ve kêmbê, ni kari bû hizrên di nav civatê de bihaniya ser zimên. Di nav civatan de axiftin ji mirovan hinek teybetmendiyên kesane dixwastin, ku ew xwe û hizrên xwe bihêne ser zimên. Pêşikê diviya bû bi kesayetiya xwe ya rûniştî, li çavên mirovên derdorên xwe tijîkirî bihêle, ta ku lê hatiba hesandin. Ji bo ku gotinên wî ji dev bihêne gotin jî, her weha kesayetiya rûniştî divêt hebe. Wekî din jî xwedayina û guhdarkirin jî vê yekê dixwast. Bi wan taybetiyan re, divêt mirov bihêne ser zimên, ku mirovên ku di nav civatan dirûniştin, zane dihatine jimartin. Ji ber vê yekê jî, çav li ser wan her dem hebûn. Mihemed kurê begê wan bû, ji ber vê yekê jî wetayeke wî jî hebû. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje, ku hatina wî ser zimên ku amade be, ji devê seydayê wî yan jî, ji devê yên ku wî nas dikin taybetiyên wî yên baş dihatine ser zimên. Pê re jî kêmasiyên wî jî dihatine ser zimên. Mirov di nav civatan, weke ku di nav komekê rexne û rexnevanan de be, ew ji ber çavan dihate

derbaskirin. Ew ên ku zêde li ber çavan herî pir li civatê dirûniştin, bi zanebûnên xwe kesayetiya xwe didane erêkirin. Zanebûna xwe dihanîn hesandin, ji bo ku di nav civatê de axiftin pir taybetmendiyan girîng dibûn. Her weha di nav civatekê de bi piralîyan ve fêr têt girtin. Naskirin, fêrbûn, têgehîştin û kesayet, di civatan de xwe didane derve li ber çavan. Ji aliyê naskirin û fêrbûnê ve guhdarkirin pir gerek û girîng bû. Ji aliyê têgehîştin û kesayetiyan ve jî meyizandin û bi meyizandina xwe re encamgirtin pir gerek û girîng bû. Kesên ku di nav civatan de dirûniştin, ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, weke dengbêj û wêjenasên mazin û xwedîfêr bûn. Çîrok û her weha vebêjên bi gotin û hanîna ser zimên, bi xwe re zimanekî wêjeyî dixwaze. Lê zimanê helbestmendî jî her weha weke beşek ji vê vegotina wêjeyî dihate afirandin. Bi vebêjan re avêtina ser kesayetiyan jî wêjeyek bi helbestmendî dixwast. Zimanê te ne bi helbestmendî bûya, di nav vebêjan de, yên ku dikari bûn vê yekê pêk bihaniyana jî, tevî gotinê dibûn û bi gotina yekî û helbestmendiya yê din jî, bi taybetmendiyan xwe ve ji serî ta dawiyê vebêj dihate ser zimên. Di gotinan de taybetmendiyan herî ku li ber çavan bûn, dihatine girtin. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku ew kes pir bi wan taybetiyan jî di nav civatan de dihatin naskirin. Ji aliyê hanîna ser zimên û li gor taybetmendiyan gotinan jî, hanîna ser zimên, ji taybetiyan ku li ber çavan bûn dihatine girtin. Her weha hizir û raman, çîrok û dîrok, helbest û wêje, rêvebirin û rêveber, bi taybetiyan xwe ve, di nav civatan de ji bingeh û koka xwe yên pişt re, bi hanîna ser zimên re dihate gotin û ravekirin. Di vir de ku mirov bahsa hinek taybetiyan xwezayî yên civakê, yên ku xwe berdewam kirine bike, taybetmendiyan pir girîng û mazin divêt werine ser zimên. Civak li gor taybetmendiyan xwe yên xwezayî, her weha di

civatan de dihata ser zimên. Zimanê xelkên herêman jî, her weha digehîşt hevdu. Bûyerên ku di civakê de dibûn, bi zimanê xelkê bi awayekî wêjeyî dihatine ser zimên. Vê yekê jî li ser mirovên guhdar, hîkariyeke pir mazin dihişt. Di nav civakê de beg an jî axa jî ba, her weha bûna gotinên bi vê rewşê re dibûn sereke. Di wê demê de serekayetî her weha xwe li ber çavan xwe dida nişandan. Vê yekê jî li ser mirovên ku ji nûke ve mazin dibin û pêş dikevin, pir bi wate bû. Gelek caran jî mirovên ku perwerde didîtin, dihatine di nav civatê de û dirûniştin. Kesên mazin û yan jî serekenên di nav civatê de, li lebat û rewşên wan dihate dimeyizandin, gelo ew di nêzikatiyên xwe de yan jî di zanebûna xwe de çawa ne. Gelek caran jî ew yek bi pirs û axiftinan li nav civatê dihate xuyakirin. Mirovên ku ji wan jî dipirsîn an jî li wan dipirsîn, bi zanebûna xwe ve ji ne kemî, zanistvan bûn, kesên ku navser bûn. Yên ku dikari bû têgehîjin ku bi çendîn bi pêşveçûyinan jê dipirsîn, an jî di nav hev de bi şirovekirinan re jî, ji hev dipirsin ka çendîn bi pêş ve çûne. Di wê heyamê de yê di civatê de dirûniştin, hem li pirsvanan û hem jî li bersivdêran pir bi bal dihesandin. Hizrên wan, bi hatinên dema pirsbûnê, ji wan dipirsîn û diviya bû bikaribin bersivên xwe bidin.

Bêguman di zanebûnê de hatina pile û radeya herî mazin di civatê de xwe dida xuyakirin. Di axiftin û gotinên xwe de, di nav civatê de wî pile û radeya xwe dida derve. Di vir de divêt mirov bêje, ku kêmasiyên ku di nav civatê de dihata dîtin û gotin jî, ne dihate ji bîrkirin. Ji ber vê yekê jî ew kes pir bi bal tevdigerin. Yekê ku diçû nav civatekê û rûnişti ba, mazin û zane dihate jimartin. Ji xeynê wan, vê yekê jî gelek mirov jî diçûn li civatên din dirûniştin. Ew hati bûn daku tişteki fêr bibin. Lê divêt mirov bêje, ku riya axiftinê jî pêş ji kal û pîran û navseran re bû. Her weha weke dibistaneke civakî û ya

destpêkê, ku em civatan bijimêrin, me bawerî heye ku wê ne xelet be. Ji ber ku ev di gelek xalan de xwedî wate û erk bû. Hizir û ramanên civakê û pirsgirêk û li çareseran jî lêgerîn, di civatan de dihate rojevê. Divêt mirov bêje ku rojevên xelkên civakê jî, di civatan de dihate zanîn: "Î roj di nav civata beg de, yan jî di nav civata mêhvanan de wan hizir û pirsgirêkek her weha hate gotin û guftûgokirin", dihate gotin di nav xelkê de. Lê hemû xelk jî her weha, ji rojev û guftûgoyên hevdu bi riya seydayan re, yan jî kesên ku dihatin û diçûn agehdar dibûn. Agahdarbûn jî bi xwe re hizrên hevdu ji hev re û bi hev re dida li hevparkirin.

Mihemed bi biçûkatiya xwe re li civatan dibe xwedî nasbûn. Lê yê ku wî bêhtir dike xwedî nasbûn jî, zanebûn û zûfêrbûna wî bû. Mirovên ku serê wan ji fêrbûn û têgehîştinê re vekirî be û mejiyên wan zû hilbigire di civaten de bi wan re teybetmendiya bi xwe re dihata ser zimên. Mihemed jî ji wan aliyan ve xwediyê jêhatiniyekê bû. Jêhatîbûn di bingeha xwe de hizir diparêze. Jêhatîbûn jî bi hizir re weke zanebûneka kesayetiye, xwe di ber çavan de dida nîşandan. Lê jêhatîbûn tenê hizir di bingeha xwe de na bîne. Ji xeynî wê yekê jî weke hinek taybetiyên ciwanî, rê ji xwe re dide nîşandan. Di fêrbûnê de mirovek ne jêhatî be, yan jî weke ku di nav xelkê de dihata gotin; şevkorî be, zû dihate dîtin. Yekî ku şevkorî jî ba, wî çaxî di nav xelkê de hinek gotin weke bi rexne, jê re dihatine gotin. Wekî din jî, li gor gavavêtinên wî navpêvekirin jî çê dibû. Her weha jêhatîbûn û jîrekbûn ji wan dihate xwastin. Bi vê yekê re mirov dikarê bêje, ku nejêhatinî û nejîrekî, di nav civakê de ne dihate pejirandin. Bi vî awayî, weke zanebûneka xwe bi taybetmendiya bi xwe re, xwe dida derve. Lebat, jêhatinî û jîrektî taybetmendiya, ku herî baş bûn ku dihatine pêşwazîkirin. Li gor wan taybetmendiyan

jî, li mirovan dimeyizandin û şirovekirin jî dihate cih, di nav civakê de. Ji aliyê hizir û ramanan ve be, yan jî her weha ji aliyê hinek tiştên din ve jî be, ji kesên ku weke serekeyan, an jî pêşengan derdiketin ber çavan jî, bi wan taybetmendiyan bû. Her weha hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku ew taybetmendiyan di bingehan xwe de weke tevgerê li mejî dide çêkirin. Ji ber vê yekê ye, di wê demê de li kesên ku her weha dihate meyizandin, ku ka ji fêrbûn û zanebûnê re lêhatî ye yan jî ne lêhatî, ev dihate şirovekirin. Lêhatîbûn her weha bi kesayetiyan meyizandinê re weke nêzikatiyeke biryarî dihate ser zimên. Her weha zanebûn bi hizir re xwe pir baş dihanî ser zimên. Mirov nirx û qedrê zanebûnê zani bû. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku pir girîngî didane zanebûnê. Her weha civat jî weke komelên zanebûnê bûn. Piranî mirovên beg bi zanebûnên xwe ve û navserbûnên xwe ve xwedî gotin bûn. Kesên navser xwedî nirx jî dihatine pêşwazîkirin. Begek jî bana yan jî axayek, li hevberê mirovên navser (kal bi kalbûna xwe xwedî zanebûn) xwediyê qedr û qiymet bû. Li wan mirovên di nav civakê de weke serekeyên xwezayî dihate meyizandin. Bavkalê Mihemed jî mirovekî her weha yekî navser bû. Lê wê kêlikê ne li nig wî bû. Ji wî dûr bû. Gelek gotin û vebêj ji wî ji devan bihîsti bû.

Bi destpêkirina perwerdê re jêhatîbûna wî jî hati bû dîtin. Bi destpêkirinê re jiyana wî jî her weha hati bû guherandin. Hê bêhtir hati bû li ber çavê mirovan. Kesên ku weke wî bi xwandina xwe re bûn gelek hebûn. Lêbelê ew kurê beg bû. Ji bo vê yekê jî hê bêhtir çavê xelkê li ser wî bû. Ji ber ku kêmasî û nejêhatiniyan wî ji vî aliyê ve jî hati ba şirovekirin. Bi navê kurîtiyê begîtiyê jî wê hati ba şirovekirin. Ji ber vê yekê jî begê wî jî gelekî girîngî didayê. Mihemed weke ku liberçavbûneke mazin bêt buhurandin bû. Wê kêlikê navê



wî, bavê wî û bavkalê wî bi wî re bû. Xelk jî ev yek wilo didît. Li cihê perwerdê jî ku dest pê dikir jî, çavên seydayê wî li ser wî bû. Seydayê wî jî yekî pir kal bû. Hinekî jî li nig Şêxê Îdirê ma bû. Ji ber vê yekê jî, ji aliyê zanebûnê ve jî mirovekî gelek hêvî jê dikirin. Pir zane, baş û qenc dihate naskirin.

Di fêran de fêkirina seyda ji mirovan re zor ne dihat, ji ber ku li gor taybetmendiyên zimên dida fêkirin. Li ser fêrên olî yan jî yên bi awayên din jî ba, zimanê xwe baş bi kar dihanî. Li ser quranê dest bi fêran dikir, li gor ziman bi cih dihanî ser zimên. Pêşîkê bi kurdî kite dikir û pişt re weke ku hatî nivîsînê bi dorê dida xwandin. Kesên ku li nig xwandi ba, êdî bi her awayî dikari bû bixwîne. Ku pirtûk bi wan re dida kutakirin, êdî mirov bi herdu zimanan jî dikari bûn bixwînin. Mihemed di kitekirinê de û pişt re jî ji xwandinê re gelekî baş bû. Seyda pergaleke wilo ava kiri bû, ku bi perwerdekirina xwe re, mirovên ji zimanê xwe yê zikmakî, buhurtina zimanên din, an jî ji zimanên din buhurtina zimanê zikmakî xwezayî, kiri bû. Her weha di perwerdekirina xwe de, ev yek ava kiri bû. Bi vê yekê re kesê ku dest bi xwandinê dikirin, pişt re hêdi hêdi zimanê wan jî bi xwe re dikir bi pergal. Di gotinê de her weha pirtûkên, ku ne ji zimanê zikmakî jî ba, mirov bi kitekirinê, bi serê xwe fêr dibû û dixwand. Mirovekî ku bi tenê maba jî, her weha pirtûka ku ne ji zimanê wî jî ba, dikari bû bi zimanê xwe bixwîne. Kitekirin û xwandina bi dorê, di perwerdedayina seyda de, dibû weke zimanekî fêrbûnê. Lê bêguman her du ziman jî, ne ji zimanekî bûn. Du ziman bûn. Lê bi her du zimanan jî her weha bi avakirina pergaleke xwezayî, weke ji zimanekî di perwerdê de bi kar dihatin. Herdu ziman jî, her weha di perwerdekirinê de, bi nêzîkatiyeke pergalî re ji hev re dibûn alîkar. Ji ber vê yekê hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku

perwerdekirin an jî dîtin, li Kurdistanê hinek taybetmendiyan xwe yê xweser hebûn. Pêşîkê divêt mirov bêje ku di dawiya perwerdê de gava mirovekî ji perwerdê derbas bû, êdî dikari bû bi du zimanan pir baş jî binivisanda û bixwanda. Ji ber ku di bingeh de fêrbûna du zimanan bi hev re çê dibû. Di fêrbûn û daxwaziyê de, hem zimanê dê di serî de bi pergala dibû û hem jî zimanekî din ku di perwerdê de fêr dibû. Her weha bi du aliyên, bi sazûmana perwerdê re pêşketin çê dibû. Lê di vir de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku ji ber vê şimşata perwerdê pir karkirin jê re diviya. Ji aliyê xwandinê ve be, yan jî ji aliyê nivisandinê be, karekî mazin dixwast. Ev sazûmana perwerdê li ser bingeha zimên dihat avakirin. Mirovên ku ji biçûkatiya xwe ve çî ziman bi kar haniye, li ser wê bingeha xwe fêrbûna ziman pêş dixist. Her weha divêt mirov bi vê yekê re girêdayî bêje, ku di hundurê malbatê de jî, bi vê yekê re girêdayî, fêrbûn hebû. Ji dayikê û bavî, pêşîkê weke bingehê dihat standin. Li ser wê bingeha li nig seyda dest bi perwerdê dihat kirin. Di vir de divêt mirov ji dayikê bi rêzeke mazin bahs bike. Ji ber ku ew gelekî karkereka mazin bû ji aliyê alîkariya zarokên xwe ve û ji aliyê amadekirina wan ve ji perwerdê re. Zarokên perwerdê ku li nig seydayan digirtin, gelek caran jî li nig dayika xwe ew perwerdeya ku dihildan, hê bêhtir rave dikirin. Zarok hê gava ku biçûk in, pêşîkê tema wan li ser dayika wan e. Ji ber vê yekê jî di gotina dayika xwe de alîkariya dayikê ji bo zarokan pir dibû û pir girîng jî bû. Gotinên ku di perwerdê de careke din ji devê dayika wan derdiket, li hevberê zarokan, di serê wan de cih digirt û dima.

Diya Mihemed jî her weha jê re pir alîkareka mazin bû. Ji gelek aliyên ve ji wê re dibû alîkar. Diya wê yeka zana bû. Li nig seyda xwandi bû. Perwerda xwe ya bingehîn biri bû serî. Ji ber vê yekê jî

zani bû wê ji zarokê xwe re çawa bibe alîkar, an jî di kîjan aliyan de wî alîkarî divêt. Di fêkirina xwandin û nivîsînê de alîkareka mazin bû. Ji bo dayina ravekirinê jî her weha gelekî dibû alîkar. Zaro di biçûkatiya xwe de, li devê kesan dimeyizînin, kanê wê çî bêjin an jî wê çawa bêjin. Her weha nihertin li derûniya zarokan dê xwedî hebûneka pir mazin in. Gava ku dê ji perwerda zarokên xwe re xwe amade kirin, ji zaro re na bêjin ne, wê bêjin herê. Ji ber ku diya wî li nig wî ye û diya wî dibêjê herê. Rastiya dayikê dibe ya zarokê di wan nêzikatiyan de. Bi vî awayî dayik gelekî girîng dibe ji bo zarokan. Mihemed li dayika xwe dimeyizand. Her dem jî di biçûkatiya xwe de dên û bala wî li ser dayika wî bû. Di serê Mihemed de fêrbûn û dayka wî bi hev re bûn. Ev yek jî ji bo zaroktiyê pir girîng bû ji ber ku bi wî awayî re zanebûn bi xwe re xwe fikir cism û mazin fikir. Bi vî awayî bingeha cismkirina fêrbûnê, bi dayikê re çê dibû. Di perwerdê de û di pêşketinê de ev yek pir girîng bû. Ji ber ku bi xwe re awayê fêrbûna bi wî awayî di serê xwe de bi dayika xwe re çê fikir. Ji bo zarokekî ev yek dibe bingeha pêşketinê, ji ber ku ji nû ve perwerdê dike û tiştên ku hîs dike yan jî jê re têt gotin û xwandin, bi awa dike. Di awakirinê de zanîn wêne distêne di serê zarokan de. Zanîna ku wêne stand jî, bêguman dibe ya ku hatî ravekirin.

Bi xwe jî ku Mihemed gava pêşîkê dest bi perwerdekirinê dike, diya wî bi vî awayî ne bûna alîkar, wê li paş bima. Ew hîskirina diya wî ye li wê destpêkirina ketina jiyanê de jî, jê re bi vî awayî dibû bingehe. Di vir de hêjayê gotinê ye, ku divêt mirov bêje, ku nêzikatiya dayikê jî bi vî awayî girîng dibe. Bi zanebûn gavavêtin girîng dibe. Nêzikatiya dê jî bi hîskirin û nêzikatiya hesta parastinê dibe bingehe ji wî re ji bo ravekirinê. Zaro gava ku dest bi perwerdê dike, bi çendî ku li diya xwe û seyda dihesîne, ew çend jî li tevger, lebat û gotinên

derdorên xwe dimeyzîne. Ew yek jî weke kargêriyeka xwe li ser zarotiyê xwe dide nîşandan. Ji ber vê yekê bû ku piştî perwerdê re, Mihemed bi lez û bez dihate nig diya xwe û tiştên ku fêr bû bû, jê re digot. Her weha lezbûna wî di bingeha xwe de bi xwe re xwestinekê jî dida nîşandan. Mihemed her tiştêkî ku nû hîn dibû, bi lez û bez baz dida, nig diya xwe. Ev yek di salên wî yê pêş de pir çê dibûn. Ji ber ku hê gotinên ku di bin navê perwerdê de hîn dibûn, hê ne evçend mazin bûn jê re, ku cihê gotin û nêzikatiyên diya wî bigirta. Di demê de ta ku bi gotinên pê re têrbûn çê ne bûbin, wê her weha bi lez hati ba nig dayikê. Lê belê ku di demê de dest bi avakirina wêneyên di serê xwe de kir, wê demê jî wê ew lezbûna wî zivirî ba wî. Wê demê jî zû bi zû pêşketin wê bi xwe re çê kiri ba. Bi dayikê re her weha temenê xwe ava dike û pişt re bi xwe re berdewam dike. Di pêşketinê de navenda xwe ji diya xwe hêdi hêdi bi ferbûnê re dizivire di ser wî de. Ev zivirandin têt wateya ku kesayetiya wî hêdi hêdi xwe dest bi avakirinê dike û ku xwe ava kir jî, bi demê re jî dibe serbixwe. Zanebûn bi fêrbûnê re her weha di kesayetiye de rastbûneke diafirîne. Di vir de, dê, bi hebûna xwe, hebûneke mazin e. Bi rastbûnê re jî, dê di serî de, dema careke din jî ji aliyê wê ve têt watekirin. Bêguman di vir de divêt mirov bêje, ku di vê watekirinê de, dê wateya xwe kêma na ke. Hê bêhtir bi zarokan re bi wate dibe. Ev têt wê wateyê ku hizir, mentiq û zanebûn bi pêşketinê re û bi xwe re kesayetiyek daye avakirin. Bi wî awayî zaro kesayetiya xwe û ya dayika xwe jî hê bêhtir bi xwe re di wê demê dê nas dike.

Her weha ku Mihemed çend salan dixwîne êdî bi xwendina xwe re digehîje kesayetiya xwe ya mazin. Divêt mirov bêje ku ew teybetmendiyên ku di serî de Mihemed di biçûkatiya xwe de bi

dayika xwe re girtin, bi mazinbûna wî re ji holê winda na bin, hê bêhtir bi wî re weke taybetmendiyên zanebûna wî xwe dide nîşandan. Lê ew bi xwe re wê demê xwe bi xwe biryarên xwe digire û dide. Mirov ku çend baweriya wî bi kesayetiya wî çê dibe û mazin dibe, ewçend jî serbixwe dibe. Bi zanebûnê re bûyina bi sere xwe re jî, ji bo çêkirina hizrên di serî de, gelekî girîng dibe. Bi xweyîbûn re li ser dîtin û gotinên hizir di serê Mihemed de çê dibe. Mihemed her weha bi mazinbûna xwe re û di nava salên perwerdeyan de dibû xwediyê kesayetiya xwe. Gava ku biçûk bû, carina diya wî ew dihilda hevberê xwe û jê re digot; "divêt tu baş û qenc guh bidî perwerda xwe, daku tu bi ser kevî. Ku tu bi ser ketî jî, wê demê jî tu wê kari bî dunya xwe bikî lewzik. Lê ku tu bi ser ne kevî tu wê ni kari bî di dunya xwe de lewzikatiyan çê bikî." Wî jî ji diya xwe re digot; "tu mereqan ne ke dayê. Ez ê guhê xwe bidim perwerda xwe û bi ser kevîm." Ji ber van gotinên wî bi guhdar tevdigeriya û her weha di perwerde û di jiyane de gavên xwe yê xurt diavêtin.

Li nig seydayê xwe ji biçûkatiya xwe ta ku mazin bibe xwandina xwe berdewam dike. Zarokatiya xwe her weha bi xwandinê re li nig seydayê xwe dibuhurîne. Seyda pir ji Mihemed hez dike. Mihemed jî di dema ku li nig seydayê xwe dixwand, bi dil û can xwe dida xwandina xwe daku bi serkeve. Seydayê wî ku Mihemed zarotiya xwe dibuhurîne dikeve xortaniyê, êdî ew jî bi xwe re dest bi gerandinê dike û li ser hizir û jiyana mazinan dest bi axiftinê dike. Seydayê wî bi zanistî û zanebûna xwe re, li ser xwezayê gelek caran bi wî re axifî. Di axiftinên xwe de, behsa çûnên xwe yê di riyana de jê re dike. Seyda ji aliyê gotinê û bi awayekî xweş hanîna ser zimên de jî, xwediyê hunerekî bêhempa bû. Ji wan aliyan ve jî pir hîkariyek li ser Mihemed dike. Mihemed ji aliyê hestewariyê ve kelegerm bû.

Li hevberê rewşeke zû li xwe digirt. Ku Mihemed hê mazintir bû, taybetmendiyan bi vî awayî ku pê re hene, hêdi hêdi xwe di kesayetiya wî de didane der. Bi dil li xwezayê meyizandin, ruhekî bi hest dixwaze. Ji aliyên din ve jî, hestbûn ji aliyê fêrbûnê ve jî dibû weke awayekî fêrbûnê ji wî re. Hestbûn xwezayê dixwaze. Ji aliyê din ve jî hestbûn her weha bi xwediyê xwe re hizrên hestiyar dihêne ser pê. Di kesayetiya hestiyar de, hezkirin û dîtin bi awayekî taybetî xwe dide avakirin. Hizir bi hestan re jî xeynî mirovan ve jî, xwe bi wate dike. Xweza di nêzîkatiya hestiyar de, xwedî hizir e. Lê divêt mirov karibe bibîne. Gava ku mirov dît, wê demê jî mirov dikare bêje ku xweza bi mirov re xwedî kesayetî ye. Kesayetî xwe bi gotinan dihêne ser zimên, yan jî bi awayê ku xwe di tevgeran de dihêne ser zimên. Tevger ji bo kesayetiye gotineke herî xwezayî ye. Bi gelek awayan re tevgera zimên, kesayetiye pêş dixê. Gava ku mirov xwe bi tevgera kesayetiye re bihêne ser zimên, wê gavê, mirov karê xwezayê pê re dihêne ser zimên. Mihemed digot û digot ku bi çendî em dikarin ji wî têbigehîjin, ew jî dikare ji me têbigehîje.

Her ku Mihemed mazin dibû û dibû serwerê xwe, hê bêhtir xwe dikişande nav xwezayê û di nav û hizir ramanan de. Bi gotin û nêzîkatiyan xwe re, bi xwezayê re bû. Ew pir li ser xweza û mirov bi hev re dihizirî. Bi vî yekê jî, her weha hizra xwe dihanî ser zimên. Mirov bi xwe, ji xwezayê bûn, li gor hizra wî. Ji ber vî yekê jî çend xwe fahm kiri ba, wê hê ji cihekî kê maba di wê têgehîştina di ser û dilê xwe de. Lê mejî pê re heye û jî e ji ber wî xwe nas bike û fahm bike. Mirov çend pêş diket, ew çend jî xwe nêzî xwezayê fikir. Ji ber ku di serê xwe de bi hizra xwe jî xurtbûnek pê re çê dibû. Mirov bê xweza ni kare bijî. Ev yek jî, ji nêzîkatiyan wî ve xwe dida ber çavan. Lê wî ev yek çawa dîti ba û fahm kiri ba jî, ew çend hinekî jî

ji fahm û ditina xwezayê dûr diket. Mirov çend didît bi dîtina xwe ve pêş ve diçû. Hê bêhtir di rewşa xwe de bi kar û barê xwe ve diçe. Çend bi kar û barê xwe ve diçû jî, ewçend jî dibû gelek û 'tenê'. Bi mala xwe dibû gelek, lê bi xwe re jî dima bi tenê. Dunya û mirov bi xwezayê re heye. Xweza û mirov ruh dide hev. Lê ya herî dewlemend jî xweza ye. Erd her gav dizê. Roj li ezmana ye. Germê didit deşt û zozanan. Roj bi tîhna xwe ser û binê xwezayê germ dike. Bi germbûnê re û şilbûnê re xweza vedizê. 'Cisme' xwezayê di demê de xwe diguherîne. Dem û hebûna wê jî berfireh û dirêj e û bi têgehîştin e. Mirin heye lê zayin jî heye. Mazinbûn jî heye lê çêtirbûn jî heye. Hizra dûr heye gelek kûr e. Xweza xwe dide naskirin. Mirov dike ku fahm bike. Têgehîştin ji mirov re gerek e. Hizir û têgehîştin taybetmendiye mirov in. Jiyan bi vî awayî pêş ve diçe. Mirov jî bi vî awayî pêş ve diçin. Bi pêşveçûnê re nûkirin dibe. Bi nûkirinê re xurtbûn dibe. Bi xurtbûnê re pêşketina zûtir dibe û dem kintir dibe. Jiyan her weha bi zanebûnê re pêşkevîtir dibe. Her weha Mihemed li hizra xwezayê evîndariyê jî bi wate dike. Bi 'dîtin' û 'têgehîştinê' re naskirin çê dibe. Bi naskirinê re jî hezkirin di dil de cih digre. Mihemed di dema perwerdeya xwe de, di demeke kin de zanebûna xwe her weha pêş ve dixê. Bi pêşvexistina hizrê re jî, li ser pêşveçûnê dipeyive di nav xelkê de. Ji aliyê gotinên wî ve jêhatîbûna wî çavan dadigirt. Bi vê jêhatinê û gotinên xwe re, xelkê dida hizirandin. Bi hizirandindayina mirovan jî, bi tenê bi hizirandinê re çêdibe. Hizra wî zû pêş ve diçû û bêhtir dibû di heman demê de.

Mirovên ku li ser jiyan û mirin û xwezayê hizir didin hizirandin, bi gotin û hanîna ser zimên re û bi xwe re gotin, bi mirovan dide xweşkirin. Mirov hez dikir ku li wî bihesînin. Li cihên digeriya, hizra xwe ji wan re digot. Her weha li gelek cihan digeriya. Seydayê wî

gelek pirtûk dihanîn û didanê, daku bixwîne. Wî jî yên ku digihan ber destên wî, dixwand. Li ser gelek bûyerên dîrokî yên ku bûne pirtûk û li ser jiyana kesayetiyên mazin pir dixwand. Bi hesandinê re jî serê xwe didagirt. Her weha jî dirok û ji gelek kesayetiyên agahdar bû. Tenê ne der heqê wan de agahdar bû. Der heqê wan û hizir û ramanên wan de jî, zane û agahdar bû. Kesayetiyên wek Ebû Mislîmê Xorasanî, Babek, Arîstoteles, Sokrates, Eflatûn û hwd, di serê wî de bi hizir û dîrokên xwe hebûn. Ji aliyê olî ve jî, hem ji aliyê dîrokê ve jî be, hem jî ji aliyê hizir ve, xwediyê zanebûneke mazin bû. Ji aliyê dîroka olî ve, weke Adem, Îbrahîm, Aîs, Nûh, Îdrîs, Yûsif, Eyûb, Yehya, Salih, Harûn, Mûsa, Meryem û Îsa ve, yên bingehe bi wan re û bi hizirên wan re û bi dîrokên wan re, zani bû. Der heqê wan û jiyana wan de xwedî hizir û raman bû. Lê zanebûnê bi xwestekeke pir mazin re dixwast bi xwezayê re xwe biafirîne. Li ser xwezayê pir mazin difikirî. Hîkariyeke mazin ya xwezayê li ser wî û hizra wî hebû ku dihanî zimên. Evîndariyek di dilê wî de hebû. Ku dipeyivî pir bi evînê û bi hezkirin dipeyivî. Wê evîn û hezkirinê jî, ji dilê wî dihat ku kesên wî didît, li ser wan jî pir bi hîkar dibû. Gelekî hez ji gotina evîndariyê dikir ku pir jî dihanî ser zimên. Lê ji bo ku evçend mazin jî bihata ser zimên, diviya bû evîndariyek di dilê wî de heba. Dilê wî ne bê evîndarî bû. Di dilê wî de evîndariyeke pir mazin hebû. Ji ber vê yekê, ruhê evîndariyê pê re baş û pir mazin bû. Hesta evîndariyê çawa ye? Dilê bi evîn çend bi kel û germ e? Di gotin û hanîna ser zimanê wî de ew kel û germahî hebû. Evîndarî bi ruhekî û hizrekê bi hev re hatî hunandin, bi wî re dihate ser zimên. Mentiq li hevberê hestên bi hebûna xwe re çend xurt û zexm e? Yan jî ku yekî di dilê wî de evîndarî hebe, wê çend kari be bi mentiq bihizire? Di hebûna evîndaran de dil û mentiq di mejî de gelekî bi hev re şer



dikin. Di vî şerî de gelek gijolînek çê dibin. Wê çawa ji nav wan gijolînekan derkeve? Ew mijaran jî rewşeke pir tenik çê dikir. Bi çendê vê rewşa tenik jî, têgehîştin jî girîngiyekê dihêne ser zimên. Serlêdana xwezaya xwe dihêne ser zimên. Xweza ku mirov kari be meyizêne têt dîtin, ku weke ku gelek bi ruhekî tenik hatiye hundandin têt xuyakirin. Xweza ruhekî evîndariyê bi xwe re dide ber çavan. Bi xweza re habûnek û hêsaniyek di dil de çêdibe. Di rehetiyê de ruh pir bi hestiyarî tevdigehere. Dîtin û gotin tenê bi dîtina xwezayê tene re mazin têt ser zimên. Mejî di vir de têgihîştineke pir mazin û tenik dike. Dilekî û xweşbûneke jî bi xwe re dihêne ser zimên. Li gor Mihemed bi vî dilî çî kes xirab nabe, ji bo ku xirabûn çê ne be li xweza meyizandinê de. Ma gelo kê kari be ku li xwezayê bi dil re meyizêne û bi hesandinê? Ji wê re jî hebûnek diviya. Hebûna hizir û ruh diviya, ku mirov kari be li xwezayê binere.

Xweza bi xwe re evînê çêdike. Êvîn jî xwezayê xweşik dibîne. Evîn tevgereke xwezayî ye di dilê mirov û jiyânê de. Evîndarî germeke mazin e di evîniyê de. Evîn xweşikbûna dilî ye, ku gelekî xweşik dibîne. Lê hinekî zor e ku mirov fahm bike. Divêt mirov jî ji bo têgehîştinê xwediyê gavavatinekê be. Lê ma dîsan mirov dikari bû, ku xwe bigihêne bingeha wê? Bingeh weke dendikekê ye ku di dil de ye. Ew dendik ji hêzekê çêdibe. Ji ber vê yekê jî ew dendika hêz her dem dixwaze. Ev hêzxwastin jî her dem evîndariyekê li ser lingan dihêle. Mejiyê ji wî dendikê di germahiyê de dihêle. Lê ew dendik her dem jî bi mirov re ye ta ku mirov sax be. Ji ber vê yekê Mihemed dixwast xwe jî fahm bike. Li gor wî ev têgehîştin jî ku bibe wê hinekî din xwe nêziktirî 'evîna' mazin bike. Ji ber vê yekê jî digot 'hinek jî ew evîna mazin di dilê mirov de ye.' Divêt mirov wê evînê jî fahm bike. Têgehîştin demeke dûvdirêj e. Evîna dunyayê heye û

mazin e. Lê evînek jî heye, hê jî ji wê mazitir e. Divêt mirov xwe bigehîne wê dunyayê daku xwe bigehîne ya din jî di demê de. Dîtin û naskirin du dem in li pêşiya gehîştinê. Divêt ew her du dem baş û qenc werine têgehîştin, ku gehîştina demê, ji evînê çê dibe. Dîtin û naskirin jî bi xwe re zanebûnê dihêne. Zanebûn jî çêkirinê bi xwe re dihêne. Çêkirin gava ku çê bû nexwe dest bi gehîştina xwe û dilê xwe dike. Lê her dem divêt di têkoşîna têgehîştinê de be. Evîn bi carekê nayêt têgehîştin. Evîn gelekî mazin û şêrîn e. Demê û zanebûnê dixwaze. Di hundurê vê dema zanebûnê de, sebr û aram jî heye. Divêt sebr jî were têgehîştin. Aqil kêrê sebrê bike. Lê dil ne bi sebr e. Dil bêsebr e. Hizira dil jî zanebûna wî ya evîndariyê ye. Di serî de ji tova hizrê dil heye. Ji ber ku tuxmê wî di serî de heye, ku kêrê xwe bigihêne rastiyê. Ev tuxma dil di serî de hizir jî di mejî de çêdike û di nav xwe û kesayetiya de ava dike. Kesayetiya evîndarî her weha ava dibe û xwe dide nîşandan. Lê hê jî, ji gelek aliyên din ve jî, divêt di jiyane de were ser zimên. Rê nîn e, ku ji hemû aliyên ve were têgehîştin. Hest di rewşa hezkirinê de ji vê kesayetiya evîndariyê ye. Kesayetî evîndariya kesayetiyeke pir bi hest e. Ji ber vê yekê gelekî tenik e û bi hizir e. Bi şehwê re jî hest bilind dibin. Evîndarî jî bi şehwê re.. Lê hest carina jî bêşehw tevdiagerin. Divêt mirov jî fahm bike ku hestbûn ji taybetmendiyan jiyane ye her weha di vê rewşê û pêşketina wê de.

Her weha Mihemed ji hizra xwezayê û ji mirovan têdigeht. Hizra xwe û têgehîştina xwe berfireh dikir. Wî hizirkirina li ser mirov û jiyane girîng didît, ji ber vê yekê jî, ji ber ku vê têbibihîje gelekî tevdiageriya. Wî ji xwezayê dest pê dikir. Bêja xwezayê di serê wî de ne xwediyê wetayeke bi tenê bû. Bêja xwezayê di serê wî de xwediyê gelek wateyan mazin û hizrî bûn. Xwezaya mirov û suruşt

li gor wî bi hev re bûn û wê bi hev re jî hebûna xwe berdewam bikirana. Ku li ser xwezayê fikir weke xweza hêzek be û bi ruh be û xwe di mirov de bihêne ser ziman, nêzîkatiyekê bi zanist re nîşan dida. Li gor wî mirov ne bê zanist e. Mirov xwediyê zanist e. Lê ma ka mirov wê çawa ew zanist bi kar bihaniya. Ji vê yekê re jî zanebûn û hizir diviyabû. Mirov jî dikari bû xwe bi zanebûnê re bi hizir bike. Lê zanebûn taybetmendiyeke herî bilind e. Ji bo ku xwe bigihêne wî jî diviyabû baş û qenc tevbigere. Bi vê yekê re jî, ji van gotinên hizrên wî dihanîn ser ziman. Mirov dikarê bi aqilê xwe re, xwe bi xwe bi hêz ke. Li gor vê yekê jî, ji xwe aqil hêzeke pir mazin e. Hêzbûna mejî têgehîştina jiyane ye. Têgehîştin hêzbûneke çêdike. Ku mirov nuha her weha wê hêzbûnê şirove bike, mirov wê bibîne ku têgehîştin bi xwe re ruhekî ji diafirîne. Ew ruh jî bi du aliyan divêt were têgehîştin. Aliyek jî ji zanebûnê têt. Ev aliyê dinê jî bi têgehîştin û naskirinê re çêdibe û pêş dikeve. Mirov bi van aliyan re pir pêş dikeve. Lê aliyê duyemîn ku baş ne yêt têgehîştin, wê ev aliyê zanebûnê jî kêmbimîne bi mirov re. Ew jî bi zanebûn û têgehîştinê re çêbûne ezbûna mirovan de wateya xwe dihêne ser zimên. Ezbûn bi xwe re baweriyê çêdike û her weha baweriyê jî dihêne ser zimên. Ezbûn ku ne be wê tirsandin û xwe paşvekişandin çêbe. Ji ber vê yekê jî ezbûn di jiyana mirovan de gelekî girîng e. Li gor Mihemed gava ku mirov ezbûnê şirove dike, mirov dibîne ku weke bingehê tenê ji mirovan re têt ser ziman. Bi vî awayî di gotin û nêzîkatiyên xwe de, gelekî li ser dirawestiya. Li ser gotina 'ez ji bo te..' weke gotineke kesane dizanî û didît. Ku dihizirî bi xwebûnê didît. Ji ber vê yekê bixwebûn ji bo ku pêşkeve divêt ku ezbûn hebe. Ezbûn bi mirovan re serbixwebûna herî mazin e. Ku mirov dihizire û dibîne, ku gotina 'ez ji bo te' ezbûn û zanebûnê bi hev re dixwaze

ji mirovî. Di vir de li gor Mihemed divêt mirov li xwezayê bimeyizîne. Ku mirov li xwezayê meyizand mirov wê di demê de bersivên mazin û yên çareseriyê bibîne. Lê li gor Mihemed mirov çawa dikarî bû bêje ku mirov xwezayê fahm kiriye? Li gor wî tenê xwezaiya xwezayê têgehîştin ne têgehîştineke tê e. Ku bi xwe re bi xweza bû wî çaxî wê ji jidandina xwe ya bi xwe re hew be. Ku jidandinên mirov çûn û mirov ji xwe rehet hîs kir û hizirî, wê çaxê jî mirov dikare bibêje, ku têgehîştin û têkilî çê bûye. Lê mirov dikare bibêje ku her bende ku bi mirov re hene, dûrbûna mirov ya ji xwezayê bi xwe re dihênê ser zimên. Xweza bêbend heye. Xweza bi bendan re ji holê radibe. Mirov bi xwe re her weha jî, bi du aliyên jiyanê dibîne. Aliyek mirov dixwaze bêbend be. Lê aliyek wî jî dixwaze bi bend be. Ev jî suruşteke mirov e ku dijî. Aliyê xwezayekê bêbend, bendan diqetîne û dike ku bi pêş ve herikîn çê bibe. Lê ku çû pêş jî, li wir jî hinek bendên din mirov bi xwe re çê dike. Wek bext têt serê wan bendan jî di pêş de. Divêt were têgehîştin, ku her dema ku dibuhure, bi xwe re zanebûnê çêdike. Weke zencîreke mirov li vê yekê bihizire. Zencir çend jiyan berdewam dike xelekên wan jî pir dibin. Bi jiyanê rê safîbûn jî bi xelekên re derdikeve holê. Ev zelalbûn jî hizra û zanebûna ku pê re çê dibe û pê dikeve. Pêşketin her weha di jiyanê de çê dibe.

Xweza, mirov û evîndarî hinek gotinên pir girîng in di hanîna wan ya li ser zimên. Ji bo pêşketina hizirê, evîndarî weke bingehekê didît. Li kurahiya wî evîndarî taybetmendiyek xwezayê bû. Lê bi mirov re bi zanebûn dijiya. Di xwezayê de jî di evîndariyê de jî zanebûn heye. Lê divêt mirov kari be bibîne û têbigehê. Ji bo têgehîştinê jî meyizandin û dîtin li kûrahiya wî gelekî girîng bûn. Li gor wî evîndariya herî rast yê ku herî xwezayî ye. Ku evîndariya

xwezayî bû wê çaxê ji hev xuya dibe. Ji hev xuyabûn, di evîndariyê de weke rastbûnek têt ser ziman. Lê zelalbûn şiyana evîndariyê ye. Evîndarî şiyana mazin e. Her evîndariyek şiyaneke wê heye û ev şiyana ku rast hate dîtîn, di wê çaxê de mirov dikare bêje ku mirov dikeve di riya evîndariya herî rast de. Evîndarî bi rê ye. Riya wê ji dil dest pê dike, lê bi mejî re jî xwe berdewam dike. Di wê berdewamkirinê de ji bo bi destxistinê serûbinbûnek di dil de heye. Dest bi dest dixwe di demê de. Lê ka ma dil jî bi dest re bi dest dixwe? Di vir de ji Mihemed re hizra xweşikbûna mazin ya ku bi dil re ye, dikeve dest. Bi evîndariyê re xweşikatiyeke têt ser zimên. Ev xweşikati jî xweşikdîtîn e. Ji bo xwe gihandina wê dîtine jî têkoşîn têt dayin. Dil dixwaze bi dest bike. Ji ber ku dil xweşik dibîne. Dil ku bi dest jî dike, dilxweş dibe. Dilxweşbûn divêt bigehîne evîndariya herî mazin, ya ku hebûna xwe berdewan dike. Mirov ji bo xwe bigihîne evîndariya herî mazin divêt xwe biwestînê da ku di demê de xwe bigehîniyê.

Her weha Mihemed hê di ciwaniya xwe de xwe bi hizir dike û hizra xwe dihênê ser zimên. Li ser evîndariyê û xwezayê pir kûr dihire. Ew bi xwe jî hez ji xwezayê dike. Li ser evîne bi evîndariyê û xwezayê hûnadineke pir mazin di gotinên xwe de çê dike û dihêne ser zimên. Dilê wî hingê bi evîne re mazin e bi evîna xwe re dipeyive. Hingê dilê wî evçend ji vî aliyê vê tisiyê, bi gotinên evîndariyê dilê xwe difûrine. Dilê wî her dem difûre weke sirê li ser êgir ku bi kel re difûre. Ev fûrandina dilê wî jî hin bi hin çend kûr dibû xwe mazitir dida derve. Ku digihê dema ber ciwaniya xwe, êdî hizra xwe di nav mirovan de dihêne ser zimên. Bi hanina ser zimanê xwe re jî, zanibû mirovan li xwe bide hesandin. Li gotinên wî dihesandinê de bi mirovan re hem dilxweşiyek çê dibû û hem jî fahmek dihata girtin

bi mirovan re. Gelêk caran jî di nav civatan de li nig seydayê xwe dirûnişt. Lê car bi car jî di nevbera bav û seydayê xwe de dirûnişt. Seydayê wî jî mirovekî bû, ku pir rêz jê re dihata dayin. Hê evçend biçûk û mazin lê dihesandin, hinekî jî para seydayê wî jî tê de hebû. Mirovên dihizirin, ku mirovekî li nig wî seydayê zane bi xwe ne we geleki bi zane be. Ji ber vê yekê jî di serî de weke ku gotinên seydayê wî bixwazin ji devê wî hiskin, lê dihesandin. Di demê de wî jî bi vê rewsê re ji xwe weke seydayê xwe dide erêkirin bi mirovan re. Mirov hîn bûbûn ku di demê de Lê bihesênin. Bi lê hesandinê re jî hizir û ramenên wî fêr dibin û nas dikin. Bi awayê ku wî dihanî ser zimên re, li ser mirovan jî hîkarî çêdikir. Bi ziman û xweş gotinê re hîkariya wî li ser mirovên xwe dide nîşandan. Her gotinên ku ji devê wî derdiketin, weke rêzên helbesteke li pey hevdu, ji nav lêven wî derdiketin. Her weha awayekî gotinê pê re hebû ku di gotinên wî de dida nîşandan. Ji aliyê gotin û hanîna ser zimên ve, xwediyê hûnerekî pir a mazin bû. Di gotinê de bêjeyên dihatina gotin û awayê ku pê dihatine gotin, di serweriya wî yê ser ziman de xwediyê herikandineke pir a zelal bûn di vebêjîna wî de. Pêşîkê di serê xwe de hizra xwe çêdikir û pişt re digot. Di gotinê de jî gava ku dipeyivî û her gotina ku digot, Pişt re zanibû ku we kijan gotinê bihêne ser zimanê xwe û bibêje. Bi vê yekê re gava ku dipeyivî ne aliqandin û ne ji qutbûn di nav herikandina gotinên wî de çê dibûn. Ve yekê jî li mirovan hîkarî dikir. Bi vê yekê re mirov bi bandûr dibûn. Hûnera wî ya axiftinê her weha xwediyê hinek taybetmendiyan bû ku dibû temenê xweşik axiftina wî di nav mirovan de. Her weha hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku bi çendî hizra wî ya li ser xwezayê xwezabûnek di kesayetiya xwe de jî çê kiri bû. Di nav peyivtinên xwe de gelek nimûneyan jî ji teyrikan jî dide. Vê yekê jî bala mirovan pir

dikişand. Gelek caran jî di gotinên xwe de li ser teyrikan digot "ew jî can in, ew jî bi ziman in". Bi awayekî kûr ku hîkarî li ser mirovan dikir û mirov jî di serê xwe de divejandin û bi nimûneyên wî re kûr dihizirîn. Bi her gotinên wî re weke ku di dil û serê mirovan de tiştin bivejin. Vejînbûna hizir di serê mirovan de divekir. Hê bêhtir mirov di serên xwe de kûr û kûr dikir bi hizirandinan re. Bi vî awayî Mihemed bi gotin û hanina ser zimanê xwe re, di serê mirovan de wêneya jiyane bi zanebûn çêdikir. Her weha wêneyekî ku di serê mirovan de bi hizir û zanebûnê dide avakirin jî, gelekî mazin û berfireh bû. Mirov bi vî awayî bi zanebûnê re hevdîtin pek dihanîn.

Jiyan xwediyê teybetmendiyan pir mazin û xwezayî ye. Jiyan li gor wan teybetmendiyan xwe bi wate dike. Watekirin di jiyane de teybetmendiyeke ji bo mirovan. Her weha bingehek e jî ji pêşketinê re. Pêşketin bi naskirin û têgehîştinê di jiyane re xwe radigire û dihere. Her weha zanebûn pêş dikeve û xwe dide nîşandan. Zanebûn di jiyane de bi hebûn û wateya xwe xwediyê hinek teybetmendiyan e. Ku mirov kar kir ji wan teybetmendiyan têdigehe. Di wê demê de jî pêşketinan bi xwe re çê dike. Pêşketinên , ji pêşketinên jiyane ne. Jiyan û di têkilîyan de bi hevdû re zanebûnê derdixin holê. Bêgûman divêt mirov bêje ku taybetmendiyan gelek in û mazin in. Li gor nêziketiya Mihemed xwediyê taybetmendiyan wisa ne ku divêt mirov baş û qenc wan taybetmendiyan bibîne û fahmke. Li gor wî ew taybetmendiyan weke mirov bi fêrbûna tîpan re fêrbûna xwandinê dibe, her weha divêt mirov nêziketiyeke li jî bike. Li gor wî hinek teybetmendiyan xwe ji xwezayê digre û her weha bi wan teybetmendiyan re bi navenda xwe re pêşdirove. Lê pêşketinên, li gor nêzikatiya wî xwediyê du taybetmendiyan mazin û girîng bûn. Teybetmendiya

pêşî bi hîskirin û dîtinê re tevgerên, ku tenê kirin û her weha bi aliyê duyemîn re jî guharandina bi wan tevgeran re çêdibe. Aliyê duyemîn ji têgehîştin û çêbûna zanînê ye. Li gor wî ew taybetmendiyan weke temenekî ye ku divêt mirov ji bo têgehîştin jiyane qenc fahmke. Li gor wî tenê digire lê ye ku bi pêşketina kesayetiyê re dide jî mirov bi xwe ye. Di dayinê de gava ku mirov destgirtî bû mirov dikare bêje ku bi taybetmendî û awayên ku di de hatine standin re têkilî heye. taybetmendiyan xwe di gelek awayên ku di jiyane de hene, weke nêzîkatiyan dihêne ser zimên û bi hanîna ser ziman re xwe dide nîşandan. Her weha bi vê yekê divêt mirov baş û qenc xof û gûmanên, nêzîkatî û berdestên, bandûr û azmûnên ku li ser bi bandûr in, fahm dike.

Her weha Mihemed xwediyê wan nêzîkatiyan bû ku di jiyane de bi hizir û wate bûn. Jiyan ji bo wî divêt hatiba têgehîştin. Lê jiyane bi carekê çî kesekî ni dikari bû fahm bike. Ji ber vê yekê jî divêt mirov xwediyê israr û hinek teybetmendiya zanînan be, ta ku mirov kari ba têbigihê. Teybetmendiya mirov ya herî mazin çî ye? Divêt bersiva vê pirsê ji gelek aliyan ve were dayin, ta ku mirov karibe bêje pêşve çûyin çêbibe. Carina tenê bi bersivdayinê re mirov di jiyane de bersiva xwe jî digire. Lê carina bi pirsîne re her weha mirov bersiva xwe bi dest dixê. Lê begûman bersiv di jîndayinan de xwe bi wate dike. Jîndayinên jiyane ji bûyerên ku çêbûne dihêne ser zimên. Lê em ê li wan bimeyizênin û xwe pê re bigihênin ku weke bingehe hebin. Her weha di jiyane de derfetên me yê têgehîştinê hene. Di gelek cihan de jî weke gotinên bingehe ên wek 'agirê evîne' û hwd, dihêne ser zimên. Bi vê gotinê re begûman tenê ne hesteke têt ser zimên. Bi gotinan re her weha weke hizrekî xurt jî ku di serê wî de heye jî, têt ser zimên. Her weha weke 'dilkirin', 'can û cism', 'şawq



û şamale' 'sabr û aram', 'hêvî û rastî', û hwd, gelek havok û bêjeyên ku dûbare dihêne ser ziman û di bêje ne bi wateyeke tenê têt ser zimên. Gava ku mirov bi kûrahî lê dimeyîne, di wê demê de mirov dibîne ku wate hizir xort û mazin têt ser zimên. Mihemed her weha hê di ciwaniya xwe de xwe digihîne zanyariyek mazin. Bi vê yekê re xwe di nav mirovan de dide erêkirin. Bi Mihemed re dîtî fêrbûneke baş dihêne ser zimên. Fêrbûn jî dîtîneke mazin û bi zanebûnê re dide avakirin. Lê di vir de divêt mirov baş û qenc bêje ku gelek nêzîkatiyên xwe yên bi hizirî re jî, bi nêzîkatiyên evîndarî yan jî nêzîkatiyên her weha hizirî re dihatin ser zimên. Di nav mirovan de zimanê xwe pêş dixê. Ew xwe bi vî awayî bi mirovan re dide erêkirin. Lê her weha jî gava ku dihêne ser zimên jî, ew dihire ku we bê têgehîştin. Mihemed di perwerdeya ku nêzîkatiyên olî tede xurt bûn, perwerdeya xwe dibîne. Lê çand û hizir bi taybetmendiyên xwe re bi wî re li nezîkatiyên wî serwer dibin. Di nav rewşa olî de mirovên bi civakê re xwe dide naskirin. Nêzîkatiyên civakî bi gotin û nêzîkatiyên xwe re bi gotinên xwe re derdixê ber bi pêş. Her weha bi zimanê civakê re axiftin ji aliyê hizir ve wî di nav civake de dike xwediyê teybetmendiyên cûda. Di nêzîkatiyên xwe de evîndariyê, hizir, xwezayê, mirov bi nêzîkatiyên xwe re derdixê pêş di nav civakê de. Bi vî awayî ji xwe û hizra xwe bi civake re dide erêkirin. Di demên pêşketina xwe de çend pêşdeçûn bi wî re çêbûba evçend jî bi ruhê mirovan ve mijûlbûn pê re çêdibû. Di mijûlbûna giyanî (ruh) de, ji xweza û evîndarî, ji mijarên sereke diditin. Ew bêjeyan jî bi wateyek pir mazin di nav gotina xwe de dihanîn ser zimên. Meyizendina wî ya li mirov bi germahiya ruh û dilê mirov re çê dibû. Têgehîştin û zanebûna wî her weha bi ve germbûna mirovan re xwe dihanî ser ziman. Wateyeke bêjeya 'evîne' jî bi hizira dil ku wî dihanî

ser ziman, ji vê nêzikatiya wî xuya dibû. Di vir de hêjayê gotinê ye ku, divêt mirov bêje, 'evîndariyê' jî her weha xwediyê gelek nêzikatiyên watedar bû, ku pê re dihatine ser zimên. Her weha bêjeyên ku dihanîn ser ziman, gelek ji wan bêjeyan di hizra wî de bingeh û pirwateyî bûn. Weke wateyên mirov, zanîn, têgehîştin, dil û hwd, gelek wateyên bingeh ku li gor hinek bêjeyên ku didan xuyakirin. Bi hanîna wî ya ser ziman re, di gotina rewşê de, di zimane wî de jî her weha pirwateyî heye. Di wateya bêjeya rewşê de, weke hizir, zanebûn, têgehîştin, çand, war û hwd, têt ser ziman. Her weha divêt mirov bêje, ku gotinên ku ew dihêne ser ziman, ne tenê bi wateyê dihatin ser zimên. Bêje 'cism' tenê ne tiştetkî tenê ye, ku bi gotinên wî re dihêt ser zimên. Pê re hizrek jî dihanî ser zimên. Gava ku dihêne ser zimên, di serê wî de gelek hizir û nezikatiyan bi hev re û bi wateyên xwe re hene. Weke wan bêje û wateyên wan ji bo gotinên xwe re û bihaniya ser zimên. Lê li hinek ciyan ku dubare dike, dihêne ser zimên ji hinek wateyên din jî tevî wateyan dike û dihêne ser zimên.

Hizra dema xwe, Mihemed bi taybetmendiyên xwe yê zanebûnê re digire. Ew mirovekî hevdemê dema xwe ye. Hizra wî ya jiyânê, hizra zanistiya di bingeha hizra civakê de dide avakirin. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ku ji bo dema xwe di nav civakê de mirovekî zanistvan e. Mirovekî ku dema xwe fahm kiriye. Li gor taybetmendiyên civakê yê ku têne têgehîştin, nêzikatiya bi çand û hizrê dike. Ji ber vê yekê gotin û nêzikatiyên wî yê di dema wî de, ku tenê li ber çavan û bi gotinan re hizra wî jî têt dîtin û têgehîştin. Hizrên wî sûden xwe ji xwezayê û li jiyânê bi meyizendinê re digirin. Ji ber vê yekê jî divêt ji bo wî mirov bêje ku mirovekî ku zanebûna xwe pir fireh û mazin kiriye. Vê yekê jî mirov dikare ji nêzikatiyên wî

û gotinên wî bimeyzêne û têbigihê. Mirov di dema xwe de hizra dema xwe fahm dike û bi têgehîştinê re bi fahm dibe. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku di vê têgehîştinê de kurbûn ji ku çêdibe, bi xwe re pêşketinê dihênê. Em bi vê yekê li nêzîkatiyên Mihemed dimeyzênin û têdigihên. Hizra demê çî ye yan jî çawa ye, li gor merc û hoyên xwe bi şirovekirinê re têt gehîştin. Bi çendî vê yekê jî, jiyana zanistvanan jî di ber çavan de bi bûhûrandinê re têt têgehîştin. Ev yek bi çendî zanîna demê ku têde têt jînkirin, ku têt xwandin û her weha ji wê jîn û xwandinê, taybetmendiyên deme dihêne têgehîştin. Bêgûman gelek zanistvanên bi jiyana xwe re taybetmendiyên deme hanîne ser zimên, hene. Ji ber vê yekê jî, hêja ye ku divêt mirov wan jiyanan jî bibîne û bixwîne, bi hizrên demê têbigihêje. Nêzîkatî di vir de weke mijareke girîng têt ber çavan. Yan jî ku hebe berhemên wan bi xwe re hanîne, vê yekê bi gotinê re didin xuyakirin. Jîn ku têt jiyîn, her weha wateya xwe mazin dihêne ser ziman. Mihemed li ser demê hinek gotinan bi me dide gotin. Dem xwediyê pêşketinan e û ji aliyê zanîna xwe ve ew dide çêkirinê. Zanîna dema damezirandinê de, di wê demê de xurt e. Lê her weha bi zanîna re jî kevneperestî wek taybetmendiya girîng xwe dide nîşandan. Pêşveçûn û paşvekişandin bi hev re bi awayeke sereke di wê demê de têt jiyandin. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku bi zanîna re damezirendina xwe çê kiriye. Li ser vê damezirandinê jî, di demê de şer dest pê kiriye. Bi vî awayî divêt mirov bêje ku bi pêşketinê û hatina hizir ser zimên, ya zanîna re ew şerê ku çêdibe, ji bextê demê xuya dike. Bi vê yekê re tenê hanîna hizir ser ziman, ji pesketine re têt nake. Bi hizir re hanîna ser zimên, bi awayê xwe re jî, xwe bi wate dike. Nêzîkatî bi vê yekê re di deme de dibe xwediyê hinek taybetmendiyên girîng. Bi nêzîkatiyê re li ser

nêzîkatiyê hanîna hizir a ser zimên jî, di wê demê de dibe xwediyê hinek girîngiyên ji bo pêşketinê. Ji bo pêşketinê, du taybetmendiyên girîng derdikevin pêş. Taybetmendiyên pêş dibe nêzîkatî. Ya duyemin jî di zanebûne de dibe kûrbûn. Mihemed li kûrahiya dema xwe, kûrbûnê digire û nêzîkatiyên xwe jî bi zanebûna xwe re dide xuyakirin. Mirov dikare bibêje ku nêzîkatiyeke pir bi zanebûn li gor dema xwe bi gotinên xwe re dide ber çavan û bi vê yekê re jî di nav civakê de wê deme dinirxîne. Mihemed ji nêzîkatî û zanebûnên dema xwe têdigehê, li gor merc û hoyên demê jî xwe têkuz dike.

Mihemed di dema xwe de bi nêzîkatî û gotinên xwe re dibe xwediyê zanîneke kûr. Li vê bingeha li gor rastiya wî, gava ku mirov wî şirove dike, mirov wî çaxî jî, ji rastiya hizrên wî têdigehê. Gotinên xwe bi awayekî ku bi gotinên çandî pêşkêş dike. Lê belê bi hanîna ser zimên re, hizrên xwe jî diyar dike. Li ser pêşketinên, hizran derdiketin holê û nêzîkatiyên rêvebiriyan jî, di şirove û nêzîkatiyên xwe de, dide nîşandan. Li hevberê nêzîkatiyên rêveberiyên xwediyê nêzîkatiyeke bi serê xwe re, xwe dide nîşandan. Nêzîkatî bi wî re weke hanîna hizreke li ser zimanê xwe dide ber çavan. Di nêzîkatiya xwe de, li hevberê rêvebiran û di nav civake de xwediyê nêzîkatiyeke bi kesayetî ye. Lê begûman nêzîkatiyeke wisan jî bi nêzîkatiyên xwe re dihêne ber çavan, ku mirov dimeyzîne ev yek di berhemên wî de xwe li rû dixê. Di nav civakê de yan jî di nav civatan de peyivtina wî, bi vî awayî xwediyê gelek taybetmendiyên bûn. Nêzîkatiyên wî ji hizrên olîtî yên din re jî, li gor hebûna di nav civakê de bû. Wê demê li nêzîkê Miksê yan jî di navenda herêmê de hizrên olîtiyê yên ji hev cûda jî hebûn. Weke filahî, êzdayetiyê û ji hizrên din ên olî, ku di nav civakê de li piya û li dar bûn. Hemû jî rastiya herêman dipejirandin. Li dema ciwaniya xwe, li nav herêman jî pir

digere. Ji navendan bigire ta ku diçe herema Xoşav û ber çiyayê Herekol û hwd. Her weha li gelek derên welêt digere. Lê di vir de divêt mirov bêje ku piranî li aliyê çiyê pir digere. Bi aliyê Exlatê ve, bi wan deran ve jî diçe û digere. Di nav xwezayê de pir hez ji gerandinê dike. Ji ber vê yekê jî demên xwe bi piranî di nav xwezayê de dibuhurîne. Li ber çiyayan gelekî demên xwe dibuhurîne. Li herêma Xoşavê cihên ku lat û zinarên mazin lê hene û bilind in, di nav zinaran de derz çê dibûn û di nav van derzan de dima, ku ji nav wan aveke hênik ku ji bin erde dizê, hebû. Li ber Xoşavê diçû li ser latên ku herî bilind in û li serê dima û li hawîrdorên xwe bi hizir dimeyizand. Lê ji xeynî vê yekê jî, carina riya xwe digirt û diçû ber Kulê Sixqê ji bo rûniştinê. Kulê Sixqê di demên ku baran bû, bi herikîna ava baranê têde bilind dibû. Ku dihata wir, diçû li ser aliyê wê yê ku weke kaşekî bilind e, di nav şînahiyê de dirûnişt û li aliyê ku li pêşiya wî dima û berî bû, lê ku cih bi cih ne jî ku darên hene, dihatine xûyakirin dimeyizand. Her weha li ber wê avên ku jî di nav latan de derdikeve, li Xoşavê hinekî bêhtir dirûnişt ta demên berêvarên dirêj ku hindik dima ji êvarê re ku reş bikeve erdê. Av li ser latenê re jî ku diherikî, weke hênikatiyeke bi herikandina xwe re ku pir xweş bû dihanî ser pê. Li dorên laten jî her weha sîmahî ji xwe dida xuyakirin. Av ku ji latan dibuhurîn û hinekî din wîr ve diçû dibû şat û diherikî. Di hearikandinê de li avê dihat meyizandin, aveke pir zelal û paqij dihat xuyakirin. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku ev ava ku di nav latan de ye, hê derneketi di bin latan de, weke kezînan dide çêkirin. Lê avên kezînan ku çêdibin û av têt û di wan kezînan de dibuhure, diçe, bi wan deran ku dibuhure û di nav kevirên axê de diçû, zelalbûneke hê mazitir çêedibû. Axê herêmên Kurdistanê sor e û ku şil jî dibe, ji avê re dibe weke

bêjingeke avê. Mihemed her hez ji cihên weha dikir. Li cihên weha di rojê de, pir demên xwe dibuhurand. Di ciwaniya xwe de hem bi bavê xwe re û hem jî bi seydayê xwe re li heremên li hawîrdorên xwe digere. Bi vî awayî hem herêman dibîne û hem jî bi gerandine xwe re li heremên cuda, weke cihên cuda jî dibîne. Bi gerandinên xwe re, ne tenê cihên jî dibîne, li herêman, di nav civatên wan de, bi maziinan xwe re dirûne û li wan ji dihesêne û dipeyive. Her weha xwe bi mirovan re dide naskirin. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku hê di ciwaniya xwe de li herêma xwe, di nav mirovan de têt naskirinê. Mirovên herêmê dest bi naskirina wî dikirin. Li nig wî jî dirûnin û li hizir û ramanên wî jî dihesênin. Mihemed bi gotina xwe li ser mirovan re dibe xwediye kargêriyeke mazin. Ji aliyê hanîna ser ziman ve, xwediye hûnerekî mazin e. Li Kurdistanê li ku derê jî ba gava ku civat dihata lidarxistin, mirov di nav civakê de weke pêşeng an jî mazin amade dibûn. Yê ku dirûniştin jî, ji mirovên zane û xwedîhizir û mazin pêk dihat. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku li herêmekê gava ku mirov xwesti ba pêşeng û zanistvanên wan, an ji her weha mirovên sereke dîti bana, diviya bû mirov here di nav civatên wan de rûne, daku mirov wan bibîne. Civat xwediye hinek taybetmendiyên weke zanebûnê, sereketiyê û lihevciwîniya civakê bû. Mirov di wan civatan de jî hizir û ramanên xwe dihanîn ser zimên û bi hev re didane têgehîştin.

Mihemed vê yekê baş dizani bû. Ewçend mazin dibû cihê wî jî di nav civatan de hê bêhtir dibû û ew dibû xwedî qedr û qiymet. Bi vî awayî naskirin ji bo wî pir mazin dibû. Di nav civatan de mirovên ku bi dengên xwe yan jî her weha bi zanebûna xwe mazin bana, di civatan de xwediye cihekî taybetî bûn. Mirov ji her weha li gor vê yekê nêzîkatî li wan kesan dikir û di nav civake de qadr û qiymetê

dida wan. Her weha mirovên taybetmendiyan xwe yen ku hene, di nav civatan de didane derve ber çavan. Di civatan de tenê zanebûnên mirovan dihatina holê. Her weha taybetmendiyan wan yen kesane jî, bi her aliyê xwe re di van kombûnan de dihatin ber çavan. Mirov di wan qadên kombûnan de, li hevdû dimeyizandin ka ma ji aliyê hizir û destvekirîbûnê ve jî qasis in an jî merd in, şirove dikirin. Her weha ji wan aliyan ve jî dihatine ber çavan û meyizandin û şirovekirin. Di civatan de divêt mirov bêje ku nêzikatiya ji aliyê zanebûnê, divêt mirov bigire ta ku digihê her weha taybetmendiyan kesayetiya li ber çavan dihata girtin. Xelk di civatan de li nêzikatiyan hevdû jî pir û baş dimeyizandin. Li gotinên mirovan meyizandin ka ma mirov zane ne yan ji hizrek cuda bi wan re heye. Mihemed mirovekî ji civakê bû û di nav civatê de rûniştibû. Lê her weha nêzikatiyan wî jî li ber çavan ve dihata buhurandin. Ji ber vê yekê jî gelek taybetmendî di nav civekê de hebûn. Bi vî awayî weke ku li nig seydayekî bi zanebûna xwe re bi nav û deng e, di kesayetiya xwandinên wan de car bi car dihata şirovekirin. Yan ji kurê miroveki sereke weke axa, begekî jî li taybetmendî û nêzikatiyan wan yê sereke dimeyizandin. Ji ber ku di ber çavan de bi buhurandin re, weke ku li radeya wan dimeyizandin ka ma çend bi zanebûnên li wan bi bal bûn.

Di bin çavan de bû Mihemed, ji ber ku seydayê wî mirovekî bi zanista xwe re, bi nav û dengê xwe re, di nav civakê de pir dihate naskirin. Rêzgirtina mirovan jê re pir mazin hebû. Bi vê yekê re bêgûman bêtirs divêt mirov bêje ku bala mirovan li ser Mihemed jî bana bi vê yekê re. Di vir de du tiştên ku di serê mirovan de bi hizir re bi tesîr bin li ser mirovan. Yek ji wan tiştan jî her weha ji aliyê malbat û seydatiyê têt xuyakirin, hatina naskirin bû. Yê din jî bi vê

yekê zanebûna xwe hatina naskirin bû. Teybetmendiya pêşî dibe bingeha heskirina navê wî jî di nav mirovan de. Lê ya ku nave wî mayinde dike, ji zanebûn û têgehîştin û hanîna wî ya ser zimên bû. Bi vî awayî re di vir de divêt mirov bêje ku bi malbat û seydayê wî re û bi zanebûna wî re taybetmendiya wî baş di nav mirovan de dide rûniştandin. Hanîna ser zimên di vir de gelekî girîng e û divêt mirov li gor vê giringiyê xuya bide. Hizrên mirovan bi kasi ku zanistî û mazin be, evçend jî gotin jî girîng dibe ji bo encama derxistinê. Gotin hizir li gor rastiyê dike malê civakê. Yan jî bi vî awayî re ku mirov bêje ku di deng de bi awayê gotinan re di gotinan de we kîjan hevok an jî bêje, kîjan tîp wê bi deng be, wî xwe di vê yekê de bi zanebûn kiri bû. Ev nêzîkatî bêguman ji bo hizrekî û têgihiştina rastiyê gelekî girîng e û divêt mirov li ser baş û qenc raweste. Bi Mihemed re ev yek hê girîngtir têt ber çavan. Ji ber ku di gotinên xwe de pir li ser vê yekê jî dirawestiya di axiftinan de. Her weha taybetmendiyan ziman di gotinan de xwe dihênin ser zimên. Di gotinên wî de jî xwe dida xuyakirin. Bi vê yekê re girêdayî hêjayê ku mirov bihêne ser ziman ku di herikandina di peyivtinê de, li ku derê wê were rawestin an jî wê li ku derê deng bêt dayin an jî her weha were kêmkirin, girîng dibe. Bi vê yekê re mirov dikare bêje ku Mihemed taybetmendiyan ziman baş û qenc bi xwe re dabûn rûniştandin. Taybetmendiyan ziman her weha ne tenê li ser pergala gotinan têt rawestin. Bi vê yekê re jî li ser zimên jî diraweste. Di vir de li gor nêzîkatîya Mihemed nêzîkatîya herî baş û qenc yên xwezayê ye. Pergala zimên di serê mirovan de bi xweza bû. Wî çaxî pêşketin û çêkirin xwe dide derve ber çavan bi mirov re. Ji aliyê zimên ve hem ji aliyê hanîna ser ziman ve û hem jî ji aliyê xwezabûne ve, Mihemed xwediyê hinek teybetmendiyan bû. Gava ku mirov li ser wî û



nêzîkatîyên wî û berhemên wî dihizire ew yek li ber çavan bi bal xwe dide xûyakirin. Homeros zimanekî bi helbestî bi xwe re çê kiri bû û pê dihanî ser zimên. Zerduşt jî her weha xwediyê teybetmendiyên ku hê divêt werine têgehîştinê ye. Mihemed jî her weha xwediyê zimanekî bi pergala bû ku xwezayî bû. Ew jî bi gotin û nêzîkatîyên xwe re yên ku bi ziman re weke zanistvanekî zimên têt ber çavan. Bi vê yekê re ji bi gotin û berhêmen xwe re gelek derfetên hizirandinê dide me.

Gava ku mirov bi Mihemed re ziman şirove dike, mirov dibîne ku gelek taybetmendiyên mazin pê re dihêne ber çavan. Dema xwe de bi teybet evçend ziman bi karhanîn tiştêkî gelekî mazin e. Ziman bi wî re taybetmendiyên xwe yên wêjeyî û hêlbestî dema wî de baş û mazin dide rûniştin. Fêrbûna olîtiyê jî bi zimanê wî re bingehêkî ku taybetmendiyên xwe dide derve û tenê bi ber çavan re bi awayekî wêjeyî û hêlbestî re pêş ve dixê. Bêguman ev yek di pêşketina olî de li Kurdistanê û di hizir de weke domaneke nuh xwe dide nîşandan û dihêne ber çavan. Pêşketinên ku di hizir û pêşketinên hizra olîtiyê li Kurdistanê xwediyê dîrokeke dûvdirêj in. Her weha ku mirov li gor domanên pêşketinan weke domanên nûkirinên olî jî bihênin ser zimên û ve yekê bijmêrin, em ê pê re bibînin ku çawa xwediyê dîrokeke dirêj û berfireh in ewan domanan. Her weha ev dîroka dirêj bi awayekî hizirî dest pê dike û hêbûna xwe berdewam dike ta wê rojê. Medan hizir di temena olê de dest bi karhanînê kirin. Piştî ku medan ji rêveberiya heremên xwe ketin jî, ji aliyê civakî û hizirî ve, vê yekê hêbûna xwe berdewam kir. Piştî medan bi pêşketina xiristîyanîyê re, ji dema duyemîn bi xwe dest pê dike. Lê ev dem bi hêbûna bindestkirina sasaniyan re bêhtir pêş na keve. Lê sasaniyan jî li hevberê wê hêbûna civakî ya

Kurdistanê gûharandin di hizrên xwe de çê dikin. Divêt mirov bêje ku bi vê yekê re bêgav dimînin. Bi vê demê re ku gûharandin dest pê dike, hinek hizrên din jî yên olî li Kurdistanê derdikevin. Manî di vê demê de derdikeve û hizra xwe ya olîtiyê çê dike. Manî li gor civaka Kurdistanê dixwaze hevgerêdanekê (sentezeke) bi hizra xiristiyaniyê û zerduştiyê re çêke û di nav civakê de demezirîne. Hizra xwe ava dike. Lê na gihê ku bi mirov re bide têgehîştin. Ji ber vê yekê jî bêhtir pêş na keve. Tenê hizra wî di nav komêkê de bi tixûb dimîne. Her weha wê demê divêt mirov weke demêke lêgerîna xwenûkirina li Kurdistanê divêt mirov ji vî aliyê ve bi navke û bihêne ser zimên. Ta dema derketina musulmanetiyê, mazdekiyan jî di nav gelek hizran de di nav civake de ji hev cuda derdiketin holê. Piştî musulmanetiyê re demêke nû ji her aliyê ve ku bi wate ye li Kurdistanê dest pê dike. Êdî hizrên din yên olîtiyê û hinekî yê Kurdistanî jî ku derdiketin bêhtir mafê hatina ser ziman ji bo xwe winda dikin. Bêguman ev yek ji aliyê civakî ve jî li Kurdistanê bi kargêrî dibe. Weke Êzdayetî, xiristiyani jî li Kurdistanê bi vê yekê re weke ji aliyê pêşketin û hêbûna hizirî yên wan ve dikevin pêvejoyeke nû de. Lê li Kurdistanê bi yekcarî ew cudatiyên ji holê na rabin ji ber ku li Kurdistanê weke hêbûna civakî û rastiya wan jî her weha xwediyê wateyeka pir mazin e. Civak di nav xwe de hizrên xwe dijiyîne û bi jiyandina xwe re berdewam dike. Di wan deman de gava ku musulmanetî dibe olek ji olên Kurdistanê, hinek demên dirêj ji bo têgihiştinê dibuhure bi damezrandina xwe re. Ji ber ku hizra olîtiyê ye ku musulmanetiyê dike hizrekî civakî. Hinek taybetmendiyan civakê bi wan mirovan re xwe dide pejiwandinê. Di wan demên teghiştinê de li gor taybetmendiyan Kurdistanî jî şirovekirin hêdi hêdî derdikeve holê. Ji aliyê ziman ve be yan jî ji

aliyê hizir ve be, di wan deman de bingehêk ava dibe. Mirovên wek Weysel Qeranî jî di serî de bi damezirandina vê temenê re û li gor taybetmendiyan civakê ji aliyê olî ve dihizirîn û dihatin ser zimên. Her weha bi mirovên weke Weysel Qeranî re temeneke mazin li gor civakê çê dibe. Mirov weke wî jî ji ber ne li gor rêveberan diaxivin bekargêrî dimînin. Wan demên pêşketinan ta dema Mihemed xwediyê gelek pêşketinên mazin in. Di vir de gava ku mirov pirojiyê jî şirove bike, mirov wê bibîne ku domanên wê li Kurdistanê diçine ta dema medan. Lê li gor demên rengdayinê jî, xwediyê hinek teybetmendiyan xwe yê girîng in. Bi vê yekê re bi wan piroj re jî li herêmên wan jî rêzgirtin jî li gor civaka Kurdistanê pêş dikeve. Ta ku Kurdistan wek civat ne hata têgehîştin, di nav civake de jî bi olîtiye mazinbûn jî hinekî zor dibû. Civaka Kurdistanê xwediyê hinek rengên ji hev cuda yê dirokî ne. Mihemed jî hinekî bi seydayê xwe re vê yekê fahm dike. Her weha bawerkirin, taybetmendî û ol bi civaknasiyan xwe yê hizirî re, di serê Mihemed de dirûne.

Gava ku dest bi perwerdê dike, pêşîkê, taybetmendiyan li herêmên li dûrên xwe hîn dibe. Pişt re li ser hizir û wateya hêbûna wan dibe xwedîhizir. Ev yek dibe bingeha têgehîştina civaknasiya ku ew fêhm dike. Her weha bingeha pêşketinê bi xwe re çê dike. Di demên perwerdeya xwe de ji hizir û diroka olê jî dide rûniştandin. Li ser vê bingehê, xwe digihêne hizir û ramanên ku hene. Mihemed Bi vî awayî re ku mirov wî şirove dike, mirov dibîne ku di nav civaknasiya welêt de jî, bi hizra xwe re xwe dide herêkirin. Her weha êdî bi gotin û nêzîkatiyan xwe re, xwe dide herêkirin di nav civake de. Lê bêguman divêt mirov du sê gotinên li ser vê herêkirinê jî bihêne ser ziman. Ji ber ku ev herêkirin jî hinek pêverojiyan di bingeha xwe de nîşan dide. Pêşîkê divêt mirov weke ku berî nuha

me gotî zanebûna wî û ji pêşketina wî yê bi herêkirinê re xwediyê temenekî mazin e. Lê li nig vê yekê têgehîştina pêverojiyên pirojê û sereketiya malbata wî jî xwediyê temenekî bingeha bi vê yekê re ye. Bêguman li gor zimanê civakê hanîna ser zimên jî bi ve yekê re xwediyê bingehê girîng e. Bi wan taybetmendiyan re taybetmendiyan din yê herî girîng jî honandine pirojiya bi zimanê xwe re di demê de hin bi hin rêza li hevberê wî mazin dike û wî bi gotin û rêza ku jê re têt nîşandan derdixe asta herî bilind.

Ji aliyê zanebûnê ve Mihemed bingeha herêkirina xwe baş çê dike. Bi gotin û nêzîkatiyên xwe re xwe dide herêkirin bi mirovan re. Mirov jî li zanebûn û hanîna wî ya ser ziman, dimeyîzînin û Lê pir guhdar dibin. Bi agahdarbûnyên re çend wî fêhm dikin û wî didin herêkirin. Zimanê wî jî her weha xwediyê hinek taybetmendiyan ku bala mirov dikişîne ser xwe ye. Bi ve yekê re gotinên wî ji di serê mirov de weke hizrekî mazin xwedî kargêrî ne. Kargêriya hizran wî ji awayê gotinên wî û ji tiştê nû ji dayîna mirovî ve têt. Mejiyê mirov ku gotinê an jî her weha hizra di hiş de digirt êdî mirov dikare bêje ku ew hizr bi kargêriya di serê wî de ye. Bi vê yekê re mirov dikare bêje ku çend di hişê wî de dimîne jî, hê behtir hizirên nû di hiş de dimîne bi xwe re çêdibe û diyar dibe. Her weha ji aliyê hizir ve, dewlemendî pê re xwe bi çêkirinê re dide nîşandan. Bingeha wê dewlemendiyê jî di mejî de dimîne û hêbûna xwe berdewam dike. Gotinên ku bi kîjan awayî dihêne ser zimên jî, girîngiya xwe bi wê awayê gotinê re dihêne ser zimên. Awayê gotinê li gor hanîna ser zimên re xwediyê hinek taybetmendiyan ku li ser mirov kargêrî dihêli. Wan taybetmendiyan hêstan bi xwe re xweş û mazin dihênin ser zimên. Hizir ku hate ser zimên jî, xeynê hizra ku di serê mirov de çê dike, bi hanîna xwe ye ser zimên re hinek hêstan ji çê dike û bi

serwer dike. Hizir û hest bi hev re pêş dikeve. Lê ku hestên li hebûna mirov serwerbûn jî, wê çaxê mirov dikare bêje ku hest hizir bi xwe re dike hizra hestiyer. Hizra hestiyer bi awaye ku Mihemed dihanî ser ziman re, hinekî ji xwe mazin çê dikir. Mihemed, mirov bi nêzîkatiyên xwe yê hestiyer re dixiste di nav hizir û hêstan de. Her weha mirov bi hizrên hestiyer re ew û hizran wî fêhm dikirin. Di vir de hêja ye ku divêt mirov bêje ku hesta welêt, di vebêjnîkên weha de, dibe weke temenekî bi mirovan re. Bi vî temenî re têgehîştinên mirov dibûne xwediyê hinek taybetmendiyan welatî. Lê hest jî gava ku têt ser zimên, çawa ku rewşeke nasik û tenik bi mirov re çê dike, her weha welat jî, di vê rewşê de hem ji aliyê hestiyarî ve be û hem jî ji aliyê nêzîkatiyên welatî ve be j, mazin û bi zanebûn tevdi gere. Bingehên nêzîkatiyên nûbûnî, reformî jî, her weha di hizra olîtiyê be, yan jî hizrên din de be jî, temenê xwe dibîne. Bi vî awayî re hestbûn û welat bi mirov re di rewşeke hizrên hestiyer digihêjin hevdû. Lê ji aliyê olîtiye ve welat xwe bi hizir re bi temen dike û hêbûna xwe berdewam dike. Çawa ku welat xwe bi hizir, hest û baweriyê dide, hebûna xwe berdewam dike, her weha bi nimûneyên dagerî (sembolîkî) re jî xwe dide aşkerekirin.

Dema ciwaniya xwe de Mihemed bingehêkî pir mazin bi zanebûnê re, bi xwe re çê dike. Di kesayetiya xwe de hizir baş dide ravekirin. Ravekirin ku çê dibe bi xwe re pêşketina di taybetmendiyan kesayetiyan de çê dike. Gava ku di taybetmendiyan kesayetiyan de pêşketin çê bû, wî çaxî mirov dikare bêje ku xwe gihandina hizran nû dibe. Gava ku Mirov di serê xwe de xwe gihande hizrên nû û hinek hizra nû di serê xwe de avakirin, wî çaxî di jiyane de jî bingehêkî xurt û mazin ava dibe ji bo pêşketinan. Mirov her weha digihê radeya ku karibe bi mejiyê xwe re di xwe de

pêşketinan çêke. Her weha kesayet hinek taybetmendiye hizerî û zanistî bi xwe re bi vê yekê re ava dike. Bi vê avakirinê re, avabûna nûbûnên ku wê bibin jî diafire. Mirov dikare bêje ku Mihemed bi mejiyê xwe pêşketinan di xwe de cîh dike û bi mejiyê xwe re jî pêşketinan dide çêkirin. Bi wî awayî re, xwe gihandiye redayeke nû di zanîna demê de. Zanîna demê xwediyê hinek taybetmendiye zanebûnê û hanîna ser zimên e. Hizer di wê demê de di rada yeka pir mazin de ye. Mirov dizane di wê demê de hizer û ramanên xwe hinekî dihênin ser zimên. Bi vê hizer re hanîna ser zimên re taybetmendiye zanînê bi mirov re dibe weke temenekî di demê de. Lê her weha di têgihîştinan de cûdayetiye bi hev re sabûnekê jî dihêne. Di nav vê sarbûnê de nêzikayeti dibe xwediyê hinek taybetmendiye mazin. Her weha mirov dikare bêje ku li ser hebûna nêzikatiye li hevber hevdû rawestan didemê de çêdibe. Mirov ni kare bêje ku têgehîştin bi tevayî di nêzikatiya ku dihatina ser zimên de, dihate ser pê. Nêzikatî di astekê wîlo de bû ku pêşketinên demê xwe di asteka herî bilind de dida xuyakirin. Nêzikatî bi hizer re çêdibe. Bêguman dîsa wê bi hizer re wê buhurandina bi xwe re çêbe. Nêzikatî bi hizer re û bi pêşketina hizerê re çêdibe û dibuhure. Mihemed tenê ve yekê di nêzikatiye xwe de na yêne ser zimên. Pê re ku mirov weke pêrspêktîfeke ji şiroveke çawabûneke jî xuya dibe. Çawabûn di nav mantiqa xwe de bingeha di nêzikatiyan de, hizer û buhurandinê jî diparêze. Weke felsefeyeke hevdemî ku her dem hizira nûjeniyê bi rih bigre bi xwe re. Bi gotinê wî ye 'ta kenge hêy hêy' re nêzikatiyeke mazin bi hizer re têt der. Gava ku mirov bi vê yekê re dihizire, mirov dibîne ku hizrek jî çêdibe. Ev gotina wî bi çendî ku di hundurê xwe de nêzikatiyeke diparêze, her weha evçend jî hizrekî di bingeha xwe de û rexnek jî

bi xwe re dihêne holê. Nêzîkatî bi gotinê re bi hizir re rexne dike. Rexnekarî bi xwe re ji nêzîkatîyekê dihêne, lê bi xwe re nêzîkatîyekê nû ji tenê. Nêzîkatî bi zanebûnê re têt dîtîn. Ku zanebûn pêş ket, wê çaxê nêzîkatîyên ku dihêne kirin û dihêne holê, dihêne ditin. Li ser wan nêzîkatîyên hizir jî ava dibin. Gava ku hizir hate ser zimên, wî çaxî mirov dikare bêje ku bi demê re bingeha gûherandinê tê çêkirin. Bingeha gûharandinê her weha bi hizir re çêdibe. Mihemed di hişê vê yekê de bû. Ji ber vê yekê li ser nêzîkatîyên hizra xwe re dihanî ser zimên. Di jiyana xwe de jî fêrên mazin didane ber çavan ji mirov re. Li ser nêzîkatîyên wî gelek gotin ji devan dihatin gotin. Her weha wan gotinên hamûkan jî gava ku ew ji cihê kûr dibe û li Kurdistanê dest bi gerandinê dike, pê re çêdibin. Mirov ku ji nû ve ew didît, nêzîkatîyên wî yên nû fahm dikirin û didîtîn. Her weha nêzîkatîyên wî di serê mirov de jî diman. Ji ber gava ku mirov ji nû ve ew didît, bi nêzîkatîyên wî yên ku balkêş dihat ji wan re. Ji ber ve yekê jî pirsîn an jî meyizandin ku lê dibû, tiştê ku mirov bi wî re didît, di serê wan de dima. Carinan mirov bi gotinêkê re jî di hişê xwe de dihêlan. Ji ber ku di didîtina pêşîkê de nêzîkatîyên bi bal qenc jî bin an jî xirab, di mejiyan de cih digirin.

Her weha di meji de cihgirtin dibe bingeha gelek pêşketinan. Lê bêguman ev yek bi mirov re hizrekî çê dike. Hizra Mihemed bi nêzîkatîyên wî re, hizrên pir mazin û qenc di serê mirov didan çêkirin. Mirov li dunya hiziran de digerandin. Mirov ku hizrên xwe di nav civakê de dihanîn ber bi pêş, her weha bêguman ev gelekî girîng bû. Ev girîngbûn bi Mhemed re xwe bi gerandinên wî re, dida ber çavan. Di ciwaniya xwe de li herêma xwe pêşîkê li wan deran digere. Lê ku mazin dibe êdî li Kurdistanê li gelek cihan digere û hizra xwe dihêne ser ziman û hizrên nuh bi gerandina xwe re, bi xwe

re çê dike. Di gerandinê de divêt mirov bêje ku weke têgehîştina Lêgerineke jî di serê wî de hêye. Ev Lêgerina di serê wî de, wî ji herêman dibe herêman. Her weha Lêgerina di serê wî de, weke li tiştêkî digere lê gelek hizr ji di serê wî de pê re çê dike. Lêgerîn di hizrê de di serê wî de heye. Hizra Lêgerînê weke felsefeyek pê re xwe dide nîşandan. Mirov dikare bêje ku lêgerîneke felsefeyî ji lêgerîna wî ye, ku di dema xwe de kir, hebû. Her weha bi lêgerîna xwe re ne tenê di hizra xwe de di pêş dîtina xwe de jî, bi hizra xwe re naskirineke pir mazin dide çêkirin. Bi naskirina xwe re jî hizra xwe dihêne ser zimên. Çend nas dike evçend jî mazin dihêne der. Bi naskirina wî re hesten waritîyê ji pê re pêş dikevin. Di berhemên xwe de her weha hestên bi zanebûnê re diyar dibin. Hestên xwe yên waritîyê li ser zanebûnê ava dike. Zanebûn her weha, ji gelek aliyên ve, pê re divêt were şirovekirin û ser zimên. Ji ber ku bi zanebûnê re, hem bi bêjeyî û hem ji bi hizirî re dihanî ber bi pêş ve. Hizra Mihemed ya waritîyê, her weha bi naskirinekê re xwe çê dike û dihêne ser zimên. Lê bêguman bêja waritîyê ye, ku bi wî re xuya dike, xwediyê gelek taybetmendiyan zaneyî ne. Zanebûna xwe di vir de bi du bingehan re mazin dike. Ya pêşîkê li ser dîtin, naskirin û têgehîştine ye. Ya dinê jî bi wan taybetmendiyan re hanîna ser zimên, xwe bi temen dike. Bingeha wateya bêjeya waritîyê, her weha bi wî re di serê wî de bi awa dibe. Bêjeya waritîyê di serê wî de li temena hizir û dirokê, mirov û war, jiyan û pêşketin ava dibe. Her weha bi wê bêjeyê re mirov dikare bêje ku pê re zanebûneke bi teghiştin heye. Ev yek jî di berhemên wî yên ku ta î roj winda ne bûne, di hatina xwe de dide ber çavan û gelek jî bi balkêş e. Li ser bêjeya war, li wateya zanebûnê digere. Di wateya zanebûnê de jî, bêjeya war dihêne ser zimên. Ji bo ku bêje war ya ku di serê wî de



mirov şiroveke, berhemên wî hizrekî mazin didin. Lê ji bo ku ev zanebûn têr be, divêt mirov li jiyana wî jî bimeyizêne, ta ku têr were ser zimên û têgehîştin. Jiyana wî jî weke berhemên wî, xwediyê hinek taybetmendiyan e, ku teybetmendiyan wê mazin in. Jiyana wî wêneyeka Kurdistanê di hûndurê xwe de diafirîne. Ev wêne jî bi gotin û dîtinên wî re, xwe bi war rê dike. Her weha mirov dikare bêje ku jiyaneke wî ya weke berhemeke dîrokî heye, ku dijî. Ev jiyana wî ye ku weke berhemeke dîrokî ku xwe dihêne ser zimên di temena pêşketina dîrokî de, her weha weke ku di dîrokê de bi hizir û raman, çand û wêje, felsefe û xwezayê re, xwe her weha weke mijarên girîng dihêne ser zimên û ber çavan. Lê bêguman mirov ni kare bi nihêrîna xwe re bêje ku ew tenê pê re hene. Ew mijarên weke mijarên sereke pê re dihêne ber çavan. Pê re hûnera hanîna ser ziman û gotin, helwêst û olîti jî, bi nêzîkatîyên xwezayê re, bi wî re dihêne ser zimên. Xweza her weha di bin gotin û hizra wî de mijareke sereke ya herî mazin e. Bi xwezayê re hizir, war, dîrok, mirov û ziman bi hinek teybetmendiyan xwe yên cûda û bi zanebûn re pê re diyar dibin. Gava ku ew xwezayê şirove dike, mantiqa xwe jî bi şirova xwe re ava dike. Di bingeha mantiqa wî û hizra wî ya mantiqê de, hizir, dîrok, mirov û war weke hinek taybetmendiyan wate bi xwe re radixin ber çavan. Lê bi rastîyê re nêzîkatîyeke ji mantiqî re dibe. Mirov dikare bi mantiqa xwe re, xwe bigihîne rastîyan. Wate, bêje, mantiq di serê wî de hinekî kûr e û divêt ji gelek aliyan ve were diyarkirin, ta ku bi zelalî were têgehîştin. Di nêzîkatîyên xwe de rastîyê weke teybetmendiyeke mantiqî dipêjirîne. Bi nêzîkatîyên xwe re rastîya weke teybetmendiyeke mantiqî şirove dike û li gor ve yekê jî weke teybetmendiyeke ya mantiqa xwe ye taybet û cuda û bingehê ve şirove dike di axiftinên

xwe de. Mihemed di demên cûwaniya xwe de gava ku ber bi temamkirina xwendina xwe ve têt, êdî di hizra xwe de rengê xwezayê û çandî hê behtir di gotinê de diyar dike. Weke zimanekî hêlbestan derdixê pêş û pê dide xuyakirin. Berhemên wî her weha ji bo ve yekê jî, ji me re gelek derfetên têgehîştinê dihêne ser ziman û dide ber çavan. Têgehîştina ku bi wî re, bi vî awayî re têt ser zimên, xwedî gelek taybetmendiyên e. Divêt mirov wan taybetmendiyên têbigihê. Bi vî awayî re têgehîştin ji mirov, di qada hizir û ramanê de bigihîne astake herî mazin. Zanebûna mirov mazin û xort dike. Nêzîkatiya wî ye li ser zanebûna weke awayekî bi hêz kirinê têt xuyakirin. Bêguman li gor wî ew radeya mirov hê behtir bi vî yekê re di qada zanînê de bilind dibe. Hizra xwe ye ku bi mirov dayî têgehîştin û li ser mirov hani xuyakirin, divêt mirov bêje ku xwediyê gelek taybetmendiyên balfireh û kûr in.

Mihemed ku ji ciwaniya xwe hêdi hêdi dibihurand, êdî hizrên wî di serê wî de her weha çêdibin û mazin û kûr dibin. Mihemed bi naskirina kesayetiya xwe re têgehîşt û mazin dibû. Divêt mirov bêje ku ev têgehîştina wî dibe bingeha pêşketina wî ya ku pê re di demên pêş de çêdibin. Piştî ku li nig seydayê xwe zanist hilda, xwe mazin dike. Lê weke mirovek zane têt meyizandin. Ji ber vî yekê jî divêt hê behtir kûr bibe di zanista xwe de. Seydayê wî gava ku di demên xwandinê de gelek caran ew jî hilda bû di rax xwe de û bi hev re çûbûn nig şêxê mazin ku li Gilîdaxê dima. Bi çûna nig şêx re jî, naskirin û têgehîştin û serwerbûn jî dihate girtin. Şêxê Gilîdaxê gelek mirîd û sofiyên wî hêbûn. Mirovek xwedî zanist û pirojiya xwe re bi deng bû. Ji ber vî yekê jî çûna nig wî gelekî bi qedr û qiymet dihate pêjirandin. Di civata şêx de li ser hizir û zanista olîtiye û ji xeynî wê yekê jî hizrên ku werine fêrkirin û yên din jî hêbûn. Şêx

gelek mirîd û sofiyên xwe weke mamoste bi kar kiri bû û di nav mirovan de hizir û gotinên wî bi pesin (wesf) û zanebûn dihanîn ser zimên û digotin ji mirov re. Bêguman di vir de divêt mirov bêje ku pesnê mirovên ku li nig wî dixwandin jî hebû. Ji ber ku li nig wî bûn û zanebûna wî dihildan. Pesna wan jî li nig wî rawestinê jî hinekî dihat. Lê divêt mirov bêje ku Mihemed jî hinekî bi pesn û serbilind bû. Zanebûna wî hebû û mazin bû. Seydayê wî jî li nig şêx bû û bi zanista mala Şêx mazin bûbû. Dikari bû bi mirovên mazin ku salên xwe dane fêrbûna zanistê re ketibin di hinek guftûgoyan de. Vê yekê jî ji zanebûn û ji xwebewerbûnê dihat. Zanebûn ku bêhtir bû êdî li xwe bawerbûn jî li ber çavan pê re xwe dide nîşandan. Bawerbûn her weha di wê demê de weke Mihemed yên ku dixwandin bi wan re xwediyê du wateyan bû. Yek; her weha ji zanebûnê dihat, ya din jî, jinêzîkatiyên olîtiye ku di nav de jî mazinbûn û pirojbûnê dihat. Mazinbûna her weha weke wateyên zanebûnê, ku di wê demê de xwedî zanebûn di nav wateya xwe de di demê de dipêjirand. Li ser mazinbûna nêzîkatî her weha weka nêzîkatiyên hinekî felsefî xwe dida ber çavan. Lê bi zanebûnê re mazinbûn û kibirbûnê jî divêt di wê heyamê de bihatana dîtin û têgehîştin. Di vir de ev dîtin ji ku çêdibû, weke taybetmendiyekê bi rûmet dihata pêşwazîkirin. Mihemed gava ku bi seydayê xwe re çûbû nig şêxê Gilîdaxê, li wîr çavên gelek mirovan hati bû ser wî. Ev çavên çûbûn ser wî jî, ne tenê ji aliyê wî ve xwe didane xûyakirin. Her weha ji aliyê zanebûnê ve jî xwedî wate bû. Lê bêguman divêt mirov bêje ku weke me pêşi gotîbû, lê dihata meyizandin, ku ka ma ew xwe mazin dibîne yan jî bi mazinbûnekê re çawa li xwe dinere. Ew mijareke girîng bû di serê yên ku di wê heyamê de lê di meyizandin de bû. Li nig Şêx pesindar û mazin tevgerîn, ne tiştêkî

biçûk dihate dîtin. Bêguman jî ne wîlo bû. Vê yekê bala mirov li wîr hamûkan ji dikişand ser xwe. Di we heyamê de ev rewş û zanebûn, ku bi hev re dihate hûnandin û di gotinan de dihate ser zimên, dibû weke rewşeke herî bilind ji bo wan mirovan. Qedr û qiymet her weha bi nav û deng re mazin dibû. Pirojî jî her weha di wan rewşan de bi zanebûnê re hev dîtin çêdikir bi mirov re. Mirov ku li diwana Şêx jî dirûniştin, gelek ji wan bi pirojîyê dihatine pêşwazîkirin. Di wan mirovan de rewşên pirojîyê dihate gerîn weke ku li xazineyekê were gerandin. Di vê xalê de divêt her weha mirov taybetmendiyeke din ya civata Kurdistanê di vir de bihêne ser zimên. Ev taybetmendî jî her weke ku têt gotin, di diwana Şêx de bi ve lêgerînê re mirov tenê xwe ne digihande hizra olîtiye. Pê re nêzîkatiyên civakî yên Kurdistanê jî dihatine ser zimên. Mirov her weha bi du aliyan re têgehîştinê dikir. Aliyek jî xwegihandina rastiya Kurdistanê, bi hizira û dîrokî ve, aliyê din jî bi berdewambûna nêzîkatiyên olîtiyê re xwe bi wate dikir. Çêkirina qesîdeyan jî di wan diwaneyan de çêdibû. Qesîde jî bi xwe re hebûna di nav civakê de jî hem bi wate û hem jî bi bêjeyi dihanîne ser zimên.

Qesîde ji gelek aliyan ve xwediyên taybetmendiyan li Kurdistanê ye. Ji aliyê pirojiye ve bi çendî xwedî wate ne, evçend jî di pirojîyê de têgehîştin û hest pêş dixistin. Bi vî awayî re nêzîkatiya hestiyar her weha di pirojiyê de çêdibû û dibû xwediyê hinek taybetmendiyan zanînan. Qesîde di mejî de hiştin ji weke pirojiyekê dihate pêşwazîkirin. Lê bêguman bi vê nêzîkatiyê re ku pirojî ji di bin de xwedî wate ye di mejî de hiştin bi xwe re rastî û hizrên civakê ji diparast û dihanî pêşerojê. Bi vê yekê re bi awayê ku têt ser zimên re, hinek taybetmendiyan Kurdistanê jî li hevberên windakirinan, bi vê yekê re tenê parastinê. Parastin her weha di bingeha xwe de

pirojîyê weke taybetmendiyeke pir girîng diparêze di demê de li Kurdistanê û berpirsiyariyeke mazin bi cih re tenê. Vî awayê pirojîyê divêt mirov li gor taybetmendiyan xwe şirove dike. Gava ku mirov bi vê yekê re her weha li berhemên Mihemed ji dimeyîzîne, mirov vê yekê baş û pir mazin dibîne. Mirov ni kare bêje, ku bi qesîdeyan re tenê hinek hizrên olîtiyê hebûna xwe ta î roj berdewam kirin. Her weha qesîde weke belgeyeke dîrokî hebûna xwe li Kurdistanê haniye ser zimên. Ev gotinên me yên ji bo qesîde bêguman ji bo wê demê ne û ji bo nêzîkatiyên Mihemed jî wateyekê dihênine ser zimên. Bi ve yekê re bi nêzîkatiyên civakê yên olî re dibe weke arşîveke dîrokî li Kurdistanê. Qesîde di we demê de li gor rastiya civakê wate digirt. Rastiya hizir û pêşketinên hizir di dema Mihemed de her weha divêt mirov bi hinek taybetmendiyan teybet û mazin şirove bike. Tenê mazin şirovekirin bêguman ji bo wî û demê wê rastiyeke bihêne ber çavan. Ev rastî ji hebûnên ku di dema wî de çêbûne û hizrên ku di demê de pêşketina xwe çawa li rastiya Kurdistanê hanîna ber çavan, wê bi wateya xwe re werin dîtin. Mihemed jî, ji vê yekê re ji me re riyekê dide nîşandan. Rastiya civakê jî li gor taybetmendiyan xwe wê were têgehîştin. Têgehîştin her weha bi vê aliyê re bi wî re mazin xwe dide ber çavan. Mihemed zanibû bi xwe re weke saziyekê li Kurdistanê bide hûnandin û bide têgehîştin. Ger û berhemên wî her weha ji vê yekê re dibin bingeh bi wî re. Hizir çawa têt dîtin? Hizir bi dîtin û têgehîştinê re têt dîtin. Çawa xwe dike weke saziyekê û dihêne ber çavan? Gava ku bi zimanekî xweş bihata ser zimên ku di serê mirov de bimîne wî çaxî, di wir de pêşketin çêdibe. Her weha gotin û hanîna wî ya ser ziman û zanebûna wî dibû bingeha pêşketinên di civaka Kurdistanê ya demê de. Bingeha pêşketinên bi hizir her weha bi xwe re dide

avakirin. Bingeha hizir û çêbûna hizir û têgehîştina dîtinan li civakê dike temenê xwe de. Ji ber vê yekê jî têgehîştina civakê divêt mirov girîng şirove bike. Hizrên civakê bi dîtinan re dizê. Her weha zabûn ji çêbûna hizir dihênê ser zimên. Mirov ku di nav civakê de, bêguman ya herî mazin ku vê yekê dihênin ser ziman. Pêşketina hizir civaknasiya (sosyolojiya) civakê di bingeha xwe de dixwaze. Ev xwastin çend bi cih hat, wê evçend mazin çêbûnên hizir bibin. Li gor vê yekê hinek nêzîkatiyên Mihemed hene. Mihemed di berhemeke xwe de li ser rast û rastteqîniyê (heqîqetê) diraweste. Her weha bi nêzîkatiyên civakî re dirabe û dirûne. Mihemed di rastîya civakê de mirovên ku li rastteqîniyê digerin hene.. 'Hêvî dikin ji rastteqîniyê' gotineke ku li gerandina li pey 'rastî'ya li tenê ser ziman. Bi vî awayîre ji temenekî tenê ser ziman. Bi xwe re nêzîkatiyêkê û hizrekî ji tenê ser ziman. Di nav civakê de, li rastiyê bigerin, tenê bi wateyê re ev lêgerîn xwe na hêne ser zimên. Bi xwe re temenekî ji xuya dike. Di nav civakê de her mirov ku her weha xwe da têgehîştinê, wî çaxî mirov dikare bêje ku xwe gihandiye rastiyekê jî bi wê têgehîştina wî re. Gotin û nêzîkatiyên Mihemed her weha bi hanîna ser ziman re bingehêkî ji xwe re çêdikin. Mirov lê dihisand û gotinên wî yên ku dihanîne ser ziman di serê mirov de cih digirtin. Bi cih girtinê re têgehîştin bi mirov re çêdibû. Bi vê yekê re giredeyî, divêt mirov behsa xweşgotinê jî bi wî re bike.

Li ser xwezayê dihizire Mihemed. Xwezayê di gelek gotin û nêzîkatiyên xwe de weke ku bi ruheke dihêne ser zimên. Gava ku li nig seydayê xwe dixwand jî, her weha vê yekê dida ber çavan. Demên xwe yên xwandine gelek ji derve dibuhurandin. Ji dervemayin û xwezadîtin bi wî re dibû xwediya hinek wateyên mazin. Her weha hizir di serê xwe de çêdikir û bi wê çêkirinê re li

xwezayê vedigot. Di xwezayê de bi nêzîkatiyên xwe re hizir di ser xwe de dikire xwedî wate. Hizrên ku di serê xwe de çêdikir ji weke ku bi xwezaye re we hizir guftûgo bike nêzîkatî nişan dide. Her weha di nêzîkatiyên xwe de xwediyê wate û çêkirina hizir bû. Wate çi ye? Li ser vê yekê dihizirî. Di serê xwe de bi wate gerîna xwe re xwe bi hizir dikir. Wate xweza ye, wate ye di xwezayê de, nêzîkatiyên watedar û hwd, ji gelek aliyên ve xwe dide hizirandin. Têgehîştin wate mazin dike. Lê wate ku hate girtin ji têgehîştin jî her weha mazin dibe. Wate û têgehîştin xwediyê nêzîkatiyeke felsefi ne di nava hizir de. Her weha ji bo li wate gerînê, divêt di vir de bi Mihemed re baş û hinek mazin şirove bike. Gotin û nêzîkatiyên wî, vê yekê bi bêhtirî, di demê de dike xwedî wate. Ji ber vê yekê divêt mirov bêje ku wate bi nêzîkatiyên wî re baş û li gor ku wî dihanî ser ziman û tiştên ku dixwast bihêne ser zimên bi hev re dihanîn ser zimên. Di demên pêşketina xwe de meyizandina wî her weha bi wî re lêgerînêke di hêbûna xwe de dide derve. Di vir de evçend kur dibû ku di xwezaye de cismên ku dilebitîn, ji wî di serê xwe de bi lebat dikirin. Av dipeyvî, lê? Wî ve yekê dikir. Mirov çawa ji zimanê teyrikan têdigehe? Ew ku li ciwaniya xwe, her weha gelek nêzîkatiyên xwezayî bi xwe re bi wate dike û bi nêzîkatiyên xwe re û bi hizra xwe re dihêne ser zimên. Çemê Dîclê radiwestiya û jê dipirsî, 'ma ka tu ji ku derê têtî û herî ku derê? Ev çi xurxur û nalîn e ji nava te têt?' Her weha pirsên ku di serê xwe de çêdikirin pir bûn. Li ser xwezayê dipirsî. Xwe di nav hizra xwezayê de kûr dikir. Avakirina hizira di serî de, ji bo nêzîkatiyên wî, dibe xwedî wateyeke mazin. Gava ku li nig seydayê xwe dixwand û ku li nav xwezayê digeriya û dirûnişt, her weha nêzîkatiyên hûneri bi xwe re dida çêkirin. Bi hevalên xwe re gerandina li nav xwezayê, li ser teyrik û

xwezayê hizra xwe ji wan re digot. Bi wan re her weha li ser xwezayê dipêyvî. Digote hevalên xwe 'zimanê teyrikan jî heye'. Hevalên wî, ji wî dipirsin 'nexwe mirov dikare bi wan re bipeyive?' Her weha têgehîştin jî zor dihat ji hevalên wî re. Pişt re li ser ve yekê bi seydayê xwe re ji dipeyive. Ew ji teyrik û sewalan hîs dikir. Di dil û serê wî de li ser teyrûk û sewalên (haywanatên) bi nêzîkatiyên ku bi hizir û hest hati bûn hûnandin, hêbûn. Di gotin û hanîna xwe ya ser zimên de ji nimûneyên bi teyrik û sewalan re dihanîne ser zimên. Her weha nimûneyên li ser teyrik û sewalan dayin, wî dike 'feqiyê ku bi tayrûkan re diaxive'. Bi vî awayî re nave wî derdikeve. Di ciwaniya xwe de her weha navê Feqiyê Teyran distêne di nav xelkê de.

Feqiyetî ji xwandinê têt. Gotina nêzîkatiya hizrê di hundurê xwe de diparaze. Feqiyetî di wateya xwe de ciwaniya zanebûnê bi hev re dihûne û dihêne ser zimên. Her weha divêt mirov bêje ku feqiyetî di nav civakê de xwediyê rêzekê ye, ku jê re nîşan didin. Mihemed feqiyekî zîrek û zane bû. Ji aliyê zû têgehîştinê ve ji bi fahm bû. Mirov ku lê dimeyizandin, digotin ku ev mirov ne mirovê şevkorî ye, mirovekî gelekî bi fahm e. Her weha hin bi hin dihate naskirin. Bi vî naskirine re, bi navê ku lê hate kirinê dihat naskirin. Mirov ew bi navê Feqiyê Teyran nas dikir. Lê Mihemed di nav yên ku wî nasdikirin de, baş dihate naskirin. Feqiyê Teyran hin bi hin di nav civakê de dihate naskirin. Ew Feqiyekî ku bi teyrikan re dida û distand. Her wesan dihate naskirin û şirovekirin. Ku gava mirov fahm dikirin ku ew feqî ye, êdî fahm dikirin ku ew mirov zane ye jî. Jê re nêzîkatî dihate kirin. Bi vî awayî li gelek cih û waran xwe dida naskirin. Li wan cih û warên ku ew geriya bû, ew weke Feqiyê Teyran dihat naskirin. Gava ku diçe nig şêxê Îdirê, şêxê Îdirê jê re



dibêje Feqiyê Teyran. Êdî ew Feqiye Teyran e. Wek Feqiyê Teyran wê jiyana xwe berdewam bike ji wîr pê de. Mihemed navê Feqiyê Teyran ji wê demê ve li xwe girti bû. Bi kirinên xwe re bi xwe re dîtînên ku hanîne ber çavan, ji mirov re wî dike Feqiyê Teyran. Gotina Feqiye Teyran gava ku tê gotin, bi hinek wateyan re, yên ku di serê mirov de diafire, têt ser zimên. Mirov wan wateyan bi xwezayê re fahm bike, wê gavê mirov vê yekê dibîne ku bihêne ser zimên. Bêguman zanebûn jî, di wateya ku dihate ser zimên de, bi gotina Feqiyê Teyran re hebû û mazin dibû. Mirov di kesayetiya wî de her weha hûnerweriyeke didîtin û pê re dihanîne ser zimên. Gotina Feqiyê Teyran her weha weke gotinêke hûnerweri jî dihanî ser zimên. Navê Feqiyê Teyran ji aliyekî din ve jî, weke teybetmendiyeke dihate ser zimên. Mirov ku ew nas dikirin, digotin ew Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran her weha nav e û navekî ku bi taybetmendiyan re têt gotin.

Hizir û ramanên wî bi navê Feqiyê Teyran re dihatin ser zimên û naskirin. Feqiyê Teyran ew mirov bû ku bi zanebûna xwe mazin bû bû. Hizra xwe bi taybetmendiyan xwezayê re dihanî ser zimên. Xweza ji bo wî xwediye hinek teybetmediyan bûn, ku werin têgehîştin. Hizra jiyane di jiyane de têt ser zimên û têgehîştin. Hizra jiyane xwediye rastîyan e ku di jiyane de ne. Jiyane her weha bi wan taybetmendiyan xwe re, ku were têgehîştin, wê mazin û qenc were têgehîştin. Evîndarî rastîya mirov e, ku di jiyane de jî dibe xwedî wate. Bêguman Mihemed li evîndariye hinekî bi teybet û mazin dimeyizand. Li ser evîndariye mazin dirawestî. Gotinên wî yên evîndariye her weha ji bo têgehîştinê bingehekî mazin ronahî û hizrê dide mirov. Li gor Mihemed û nêzîkatiyan wî ku her weha tê şirovekirin, têt dîtin ku hizra wî yê derbare evîndariye de bi hinek

taybetmendiyan re têt ser ziman. Li gor nêzîkatiyên wî, mirov xwedî dil e û dil jî bê evîndarî na mêne. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje, ku jiyana evîndariya xwediyê tûxmekî ye bi mirov re. Nêzîkatiya wî ya evîndariyê, her weha xwe bi gotinên ku wî dihanîn ser zimên, bi temen dike. Evîn di dilan de ye. Lê ew evîn jî divêt were dîtin û bê têgehîştin. Bêguman bi nêzîkatiyêke weha re mirov dikare bêje ku Mihemed dihire ku fahmkirin di evînê de heye. Ev têgehîştin her weha hizrekî dihêne ser zimên ku dibêje ku evîndarî bi du aliyan xwe dihêne ser zimên. Aliyek jê jî, ji dunyê ye. Aliyê din jî her weha ne dunyewî ye. Aliyê dunyewî mirov dikare têbigihê. Ji aliyê ku te têgehîştin jî, mirov dikare xwe li ser wê direjî aliyê din bike. Bi vî awayî mirov dikare têgehîştineke ku dem pêş ve diçe û mirov ji aliyê têgehîştinê ve pêş ve dibe, bibîne. Têgehîştin di vir de her weha dibêje ku evîndarî ye ku Mihemed dihanî ser zimên û ev evîndarî xwe bi wate dike bi mirov re. Li gor wî, hemû ne bi mirov re xwediyê têgehîştina jiyane ne. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje, mirov dikare hin bi hin, xwe bigêhene cihên hê maztir di hizir de. Hizra mirov ji jiyana temenê xwe digire. Jiyana ku dibe bingeha hizir, wê çaxê dikare bi mirov re bibe bingeha pêşketinê hê maztir. Nêzîkatiya wî yê her weha ku xwe mazin dikin, hinekî xwe dirêji xwezayê dikin. Gava ku xwe dirêji xwezayê jî dikin, wê çaxê bi xwezayê re hanîna ser zimên hê maztir çê di kir. Xweza her weha li gor wî jiyana rastîyeke mazin e, ku divêt mirov jê sûd bigire. Ji xwezayê sûdgirtin, mirov mazin dike. Bi vî awayî re, têgehîştin jî çê dibe. Her weha bû ku Mirov ji berhemên wî nêzîkatiya wî û kesayetiya wî şirove dike û gelek encaman jê derdixe. Bi hizir û ramanên xwe re bi mirov re bû. Ji ber ve yekê ji sûden mazin ji nav mirovan digirt. Bi hizra xwe re jî bi bewerî bû. Ev yek ji gotinên wî

pir baş dida têgehîştin. Bewerbûn bi wî re bi du awayan re xwe dida nîşandan. Yek jê ji aliyê beweriyê ve, xwe bi wate dike û yê din jî, ji aliyê bi bawerbûnê ve xwe bi wate dike. Gava ku Mirov ji aliyê beweriyê ve wî şirove dike û li berhemên wî dimeyizêne, mirov dikeve nav hizran de. Di vê xalê de berhemên wî weke ji me dixwazin ku em dîsan ji aliyê hizir û zanebûnê ve, bi destpêkirinê bikin. Di vir de em ê bi hizir û berhemên wî re nêzîkatiyên wî yên bi hizirî re şirove bikin. Ji ber ku her du alî dibin weke ku bi hev re di bin yek. Weke berhemeke tam û têr li ber çavan mane. Jiyana Mihemed jî xwe bi wate dike. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje, ku Mihemed di nav civakê de hizra xwe bi nêzîkatiyên xwe re gelek hanîne ser zimên. Bi hanîna ser zimên re kargêriyeke mazin li ser mirov kiriye. Ji ber ve yekê ji jiyana wî û jinbûnên wî jî, pê re gelek fêrên mazin didan ber çavan. Mirov li gor zanebûna xwe tevdigere. Mirov bi tevgera xwe re xwe dike xwedî ziman. Di vir de bi çendî zanebûn û hizir, ya herî girîng jî hesandin e. Ji bo hesandin û ji hizran, ku hene encamgirtin jî rêzek ji rastîyê re divêt, ku mirov bide nîşandan. Her weha ji aliyê rawîştîyê ve jî xweçêkirin derdikeve holê. Rawîşt bi mirov re ye. Di hebûna mirov de jî xwedî wate ye. Wateyeke mirov jî li gor rawîst e. Ji ber vê yekê jî divêt bi mirov re têbigihê. Rawîşt bi nêzîkatiyê re xwe dide nîşandan. Lê rawîşt xwediyê hizra xwe ye, ku divêt pê re were ser zimên. Mihemed her weha ji aliyê rawîşt ve, li lebat û gavavêtin, rûniştin û rabûnan, xwarin û vexwarinan, nêzîkatî dide nîşandan. Mirov ji bo wî dikare bêje ku ew xwediyê rawîştîyekê bû, ku bi mirov re rêz dida nîşandan. Gotin û nêzîkatiyên mirov wan bi hawîrdoran re dide herêkirin. Mirov dikare bêje ku gotin û nêzîkatî bi hizir re li ser mirov xwediyê tesîreke mazin e, ku di hundurê de rawîşt jî heye. Hizir ku

mirov hanî ser ziman, bi hizir re li nêzîkatiyan jî mayizandin û li gor wan hizran li nêzîkatiyan garandin jî weke taybetmendiyeke xwe bi mirov re dide nîşandan.

Her weha hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje ku rawişt di nav civakê de xwediyeê hizrekî bingeh e. Li gor nêzîkatiyên Mihemed rawişt gava ku têt şirovekirin, mirov digehîje ser taybetmendiyeê girîng, yê ku ji bo we wî bi nêzîkatiyan dihêne ser zimên. Teybetmendiya herî pêşî nêzîkatî ye. Mihemed di nava nêzîkatiyan olîtiyê de, hizir û her weha nêzîkatiyên mafnasiyê, bi gotina xwe re jî dike weke taybetmendiyeke. Mihemed di nav civakê de xwediyeê hinek nêzîkatiyên e, ku mirov ew di bin pêrgala civake de şirove dike. Her weha maf dibe beşek ji beşa wan nêzîkatiyên wî yê ku dihêne şirovekirin. Nêzîkatiyêk ku bi zanebûnê re li serweriyê divêt bê kirin. Ev bêjeya serweriyê, gava ku em di vir de ji bo vê nêzîkatiya wî dihênin ser zimên, bi du wateyên girîng em dihênine ser zimên. Yê pêşî, bi nêzîkatiyêke ku bi rêveberiya vê jî were şirovekirin, têt ser zimên. Yê din jî li ser hizra rêveberiyê têt ser zimên. Her weha hizra dadimendiyeê di nav vî hizrî de li gor nêzîkatiyên wî gelekî em di nav vi hizrî de bidine şirovekirin. Ji ber ve yekê jî, di nav civakê de li jiyana civakê meyizandin û bi nebaşiyên ku dibin, hem ji aliyê reveberiyê ve û hem jî, ji aliyê civakê ve têt şirovekirin. Lê li gor nêzîkatiyê jî, mirov dikare bêje ku civak bi ve yekê re xwediyeê rawiştîyekê ye. Di her rewşê de xwe bi pêş ve dibe. Di vir de rêvebir divêt rastiya civakê têbigehê û xwe rast ke. Ev yek jî weke xalê destûreke bingehîn e. Ji nêzîkatiyên wî têt têgehîştin, ku bi têgehîştina hizra civakê re û li gor ve yekê xwe çêkirinê re reveberî dibe rêveberiya civakê. Ew pêşketinan di vir de dibîne. Hizra wî ya jiyaneê di vê xalê de bi têgehîştina nêzîkatiyên wî re mirov dikare

şirove bike. Lê bêguman, ne li gor rêveberiya bi yekcarî re, di tevgereke bingehîn de ye. Mirov çawa dixwaze jîn bibe? Li kûrahiya şiroveya xwe, jiyana xwe bi taybetmendiye rawiştîya xwe ya civakî û olîtiyê re ava dike û berdewam dike. Mirov dikare bêje ku rewanê hizra xwe ye. Bi vê rewantiya xwe re jiyana xwe bi wate dike. Têgehîştin li jiyana û kesayetiya wî re xwediyê hinek taybetmendiye ku di jiyane de dide standin. Bêguman divêt mirov bêje ku hizra jiyana xwe bi mirov û jînbûnê re dide avakirin.

Piştî ku diçe nig şêxê Îdirê, Mihemed bi seydayê xwe re hinek biryarên ku li ser rêveçûna jiyana xwe re kifş dike. Piştî ku diçe li nig Şêx biryar dide, ku hinekî li nig Şêx jî bimîne. Li wî jî bi seydayê xwe re hinekî dimîne. Weke domanekê li wir dimîne. Bi mayîna xwe re hê bêhtir xwe kifş dike. Li herêmê û li hawirdorên herêmê digere. Li herêmê bi gelek kesên zane ne re dirûne û hizrên wan fêr dibe. Bi wan re hizra xwe ji hevpar dike. Lê her weha maeyin û hawîdor dîtî, hinekê kargerîyan jî li ser kesayetiya wî dike. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêje, ku di wê demê de li nezîkê Şêx mayî, dihate wê wateyê ku nezîki hê behtir zanistber e. Wî jî tiştê ku dixwest bêguman di radeya xwe de di nav mirovan de ev bi wate bû. Ji seydayê xwe re û ji mirovên ku naskirin, gelekî tişt fêr bû bû. Lê wî hê jî weke tiştên ku di serê xwe de dixwastin û lê digeriyan hebûn. Mirovên ku dîtibûn ji herêmên din, gelek gotin û dîtî bihistibûn. Tiştên ku hîskirî bû û bihistibû hemû di serê wî de bû û bi zindî bû. Evçend zindîbûn, di serê wî de tiştên ku hesandin mabûn wî jî dixwast her weha hê hîn bibe. Li ser Cizira Botan ji biçûkatiya xwe ve gotin dibihîstin. Bi bêhtirî jî di nav xalkên ku dima, hîs dikir. Ji ber vê yekê jî li çîrok û gotinên xelkê pir tişt dibihîstin. Di serê wî de pir tiştên ku bihistibûn, dabû hevdû, hêbûn. Di hîskirin û

bihîtinan de ji xwe re dîmenek ava kiri bû di serê xwe de. Lê bêguman weke gotinêke mazin, ku di serê wî de bi meraq hebû, ji gotinên Şêxê Teyrikan bû. Teyrê Sîmûrg çi bû, li ku derê bû? Bi vê gotinê li Kurdistanê, hema bêje ku li hamû cihan digere. Di nav gelek civatan de dirûnişt û hizra xwe ya ku di serê wî de bû dihanî zimên.

Jiyan û hûner, hizir û raman û dîtin û dîmen, di rîya kî de wî bi hev re dihunand. Hizra evîndariyê di serê wî de hebû. Bi hizir re mazinbûn ji hebû. Ji aliyê hizir ve çi li serê wî mabû rawestiya. Divêt mirov bêje, ku xwediyê zanebûneke baş û mazin bû. Gotina evinê dixwest ji dil fahm bike. Li dilê dirov dimeyizand ji ber vê yekê pir dimeyizand. Dil çawa evîndariyê jîn dike? Yan jî çawa zindî dihêle? Hizra evîndariyê tenê bi hanîna ser zimên re dibû. Bi hanîna hizir li ser zimên re dibe ku bi gihana encamekê be. Lê bêguman ew ancama ne encama bingehîn bû. Her mirovek xwediyê dilêkî ye. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje ku tiştê ku di dil de jîn be, hinekî li gor taybetmendiyan xwe ye. Her dil xwediyê hinek taybetmendiyan xwe yê xweser e. Evîndarî ku kete dil jî, divêt li gor taybetmendiyan we were têgehîştin. Her mirov evîndar bi ruyê xwe re awayê hestan dide der. Awayên hestan jî xwediyê taybetmendiyan xwe xwe ne. Rihê evîndariyê di jiyane de rihekî evîndariyê ji dide avakirin. Mirov di jiyane de li gor hest û hizra xwe tevdigere. Bi rûdan û dîtina xwe re hestên xwe bi gotin û sozên xwe re evîna xwe bi lêbat û gaven xwe yê tevgerî bi xwe dihêne ser zimên. Jiyan mirov jî her weha xwe bi wate dike. Di babeta hîskirinê de Mihemed gava ku hizran dihanî ser ziman, pir bi hêz bû. Weke ku li tiştêki digere dihizire. Her ku dihanî ser ziman dîsan tiştêk di dilê wî de kem dima. Lê ji bo wê kembûnê bibîne û têbigehê jî, di lebatên xwe de gelekî tahb dida xwe. Bi wê tahbê re jî, digiha

hizir ku pê re pêş diket. Jiyana xwe bi vê yekê re li nav lêgerînekê derbas dikir. Gava ku diçû nav xelkê û bi seyda û zaneyan re dikete nav guftûgoyan, ev mijar jî di serê wî de babeteke şiyar bû. Li nig şêxê Îdirê jî dema ku mabû, bi kesên dûrên xwe re jî diket têkiliyan de û hizra wan jî hil dida. Bi seydayên li dûrên şêx re jî dikete di guftûgoyan de. Mirov ni kare bêje ku şêx bi xwe li ser hizrên serê xwe guftûgoyan dike. Li nig şêx rûniştî li ser arzelê û berê wan li çiyaye Araratê ji xwe re dipeyvîn li ser babeten ku di serê wan de bûn. Gelek caran çavên Mihemedî diçû ser şêx. Şêx mirovekî kal bû û riheke sipî li ser bû. Li nig wî û mala wî gelek mirîd û sofiyên wî jî hebûn. Hamûkan ji bo wî tevdigeriyan. Şêx li nêzîkê Mihemedî rûniştî bû. Mihemed hê mirovekî ciwan bû. Mirovên ku li nig şêx rûniştî bûn, hema bêje hemû jî jê mazitir bûn. Di nav wan de ew mirov pir ciwan dihate xûyakirin. Lê bi zanebûn bû ku nuha di nav wan mirovên ku hemû jî jê mazitir bûn, rûniştî bû. Piranî ku dirûnişt seydayê wî jî li nig bû. Bê seydayê xwe jî, dest bi axiftinê ne dikir. Seydayê wî jî mirovekî navsere bû. Bi çûna xwe ya di nav salan de bi gotin û zanebûna xwe re, mirovekî mazin bû. Jê re rêz dihate nîşandan. Seyda bi xwe berî ku bi Mihemed re were nig şêx, berê gelek caran hati bû. Seyda bi xwe gava ku xetima xwe diqedîne, êdî pê de li mala şêx dest bi dewama xwe dike. Ji ber vê yekê jî ew bi xwe re weke mirovekî ji mala şêx dihate jimartin. Ew jî weke mirîdekî yan jî sofiyeki şêx dihate dîtin. Gava ku bavkalê Mihemed li nig bû seyda gelek alikarî jê digirt. Bavkalê Mihemed ji nêzîkî mala şêx bû. Gelek caran bi ser hev re diçûn. Ji ber vê yekê jî qadr û qiymeta wan jî ji hev re hebû. Seyda her weha li nig Şêx û mala wî xwedî qadr û qiymet bû. Mihemed jî her weha, hem ji aliyê seydayê xwe ve dihate naskirin û qadr û qiymet digirt û hem jî ji aliyê

malbata xwe ve û ji ber qenciye bawkalê xwe re jî xwediyê qadrekî mazin bû. Bi vê yekê re gava ku şêx her weha bi wan re dipêyivî û bala xwe dida wan, ev yekê ji ber çavan mirov ku li dûrên wan rûniştî baz ne dide. Dihate têgehîştin ku ewan bi xwe re mirovên mazin in. Şêx her weha kirarî bi wan re dikir. Mirov ku rûniştin bi kirarên Şêx re êdî li gor nêzîkatiyên Şêx tevdigeriyan. Her weha mirov dikare bêje ku bi vî awayî re dibûn xwediyê rêzeke pir mazin. Mirov jî wan bi vî awayî re bi dest naskirin didan. Seyda ji xwe naskirî bû. Bi wî re Mihemed ji her weha dihate naskirin di nav mirov de. Mihemed jî bi zanebûn û gotin û zimanê xwe, xweş xwe kiri bû di dilên mirov de. Ew jî bi taybetmendiye xwe re hati bû naskirin. Mirov ku ew naskiri bûn, digotin ku ew mirov bi zanebûn û bi fahm e û di xwandinê de çye û xwe bi zanebûn kiriye. Her weha nêzîkatiyên mazin je re dihatine nîşandan.

Bi nêzîkatî û meyizandinan re, Mihemed û Seyda li nig Şêx rûniştibûn. Seyda mirov ji aliyê di nav civatan de rûniştinê de, hema bêje ji aliyê hemûkan ve dihate naskirin. Mirov ku ji biçûkatiya xwe ve li nig mala Şêx dest bi xwandinê kiri bû û di nav zanist û pirtûkan de kûr bûbû. Mihemed jî feqiyê wî seydayî bû. Ji ber vê yekê jî divêt mirov bêje ku li ber çavan bû bi zanebûn û kesayetiya xwe ve. Her weha ku mirov li wan dimeyizand, li zanebûn û rêz û kesayetiya ku wan bi xwe dabûn rûniştandinê, dixuya. Mirov ku mazin dibe û hinekî bi xwe re serwer dibe bi kesayetiya xwe re êdî taybetmendiye her weha, yê mazinbûn û zanebûnê bi wan re tenê lêgerehandin. Mirov ku di serê xwe de bêje mazinatiyê dihanîn ser ziman, bi hinek wateyên civakî dihanîn ser ziman. Wateya pêşi her weha di kesayetiye de bi mazinbûne re hinek zanebûn jê lê gerehandin weke taybetmendiyeke ku dihate dîtin divêt mirov



bihêne ser zimên. Bi vê yekê re, ne tenê ev yekê jî hebû. Ji xeynê vê yekê jî ji aliyê rêzgirtinê ve jî dihate ser ziman di nav mirov û xelkê de. Bêguman di nav civatan de ev yek hê mazitir dihate ber çavan. Mirov ku li nav civatê dirûniştin, li kesayetiya hevdû dimeyizandin. Bi meyizandinê re ku kêmasiyeke biçûk jî hatibana dîtin, li ber çavan begûman wê ew kêmasi jî bihatibihane ser zimên û gotin di nav xelkê de. Mirov wilo li kesayetiya hevdu jî dimeyizandin di nav civatan de. Ji aliyeki din ve jî li gotin û nêzîkatiyên hevdu, bi vê nêzîkatiyê re dihate meyizandin, da ku fahm bikin, ku ka ma çend bi wate û mazin têt ser zimên. Ji aliyê kesayetiye ve jî ev nêzîkatî gelekî girîng bû. Di nav civakê de ev taybetmendiya jî weke radeyekê dihate şirovekirin bi mirov re. Li gotinên mazinan jî dimeyizandin û li ber çavan digirtin ji bi vê yekê, weke taybetmendiyeke li ber çavan bû. Lê bêguman nêzîkatiyên mazin ên ji aliyê dana têgehîştine ve xwe dide nîşandan.

Mihemed jî di dema xwe ya ciwanîyê de bû û ji aliyê nêzîkatî û têgehîştin û gotinên xwe ve weke ku di taqiyekê de be dihate ber çavan de. Mihemed di nav civate de jî car bi car didipeyivî. Car bi car dikete nav peyivtînan de û gotin digotin. Li aliyê Serhedê di nav civatan de car bi car li nêzîkatiyên mirovên zane û mirovên ciwan ku ji nûkeve bidest axiftinê dikirin û hinek gotinên di nav civatan de dihatin ser ziman. Her weha gotinêke bi dengê ku têt gotin ku dibêjen 'hê ne bûye cer ku ava wî nigidî be, ew hê şerbik e'. Bi vê yekê re jî digotin ku 'ka bila pêşi bibe şerbik da ku pişt re bibe sevilik, ku bû sevilikê dî wê bibe cer û ava wî bi nigidî be'. Ev gotin di qada mazinbûnê de weke radeyekê mirov dihanî ser ziman di nav xwe de. Her weha Mihemed jî di nav civatê de rûnişti bû û hê xort bû. Ji ber vê yekê ev gotin ji bo wî jî dihate ser zimên. Lê divêt mirov bêje

ku Mihemed di nêzîkatiyên xwe de ne mirovekî vala dihate xûyakirin. Ev yek jî dihate dîtin ji aliyê xelkê ve. Ji ber ve yekê ji bala xelkê diçû ser wî di nav civatan de û di rûniştinan de. Mihemed gava ku dikete nav civatan de, li mirov pir bi bal dihisand û dipêyivî. Di hesandina xwe de pir fêr jî digirt. Mirov ku li nig Şêx rûniştibûn mirov ku ji aliyê olîtiye ve bihêne yan jî ji aliyê hizir ve bibine xwediyê zanebûneke pir mazin bûn. Mirov ku pir di nav civatê de li wan dihate hesandin bûn. Bi wan mirovan re ji mayin û li wan hesandin û her weha ji aliyê wan mirov yên ku li wan di hesandin jî li ber çavan girtin jî gelekî mazin bû. Mihemed bi vê yekê zani bû. Ji aliyeki din ve jî mirov ku nuha li wan dihesand, gelek ji wan mirovên berê, ji aliyê seydayê xwe bihêne yan jî ji aliyê mirovên din yên ku di nav civatê de ji wan mirovan ku dihatine nig wan û mêhvanî li wan mirovan jî dihisand ku ka ma ewçend mazin û bi zane bûn. Lê nuha jî di nav wan de bû û li wan dihisand. Ji aliyekî ve jî ev yek jê re weke xawneke dihat. Dema ku li nig Şêx mayî gelek xelk ku dihatin û diçûn, her weha weke ku axa, beg û yên ku bi nav û deng bûn dîtibû. Bi wan re jî hevaskirin çêkiri bû. Mirov ku dihatine nig Şêx kesê mazin bûn. Hemûkan xelkê ku dihatin di nav civakê de yên bi qadr û qiymet bûn. Bi vê yekê re divêt mirov li ser şêxîtiya ku dihate kirin jî du sê gotinên bike. Şêxîti di nav civakê de xwediyê hêzeke civakî bû. Şêxîti di nav civakê de xwediyê wateke mazin e. Şêxîti gotinêke ku divêt mirov wê weke pegalake şirove bike. Gava ku ola musulmanetiye derket êdî şêxîti jî di nav civakê de pêş ket û bi sazî bû. Di kesayetiya şêxan de nêzikayekê civakî û olîtiyeke wate xwe dida rû. Lê bêguman divêt di vir de mirov hinekî here temenê bêjeya şêxîtiyê. Gotina şêxîtiyê di olên ku li Kurdistanê gelekî kevn e di êzidîtiyê de hebû. Di êzidîtiyê de ji gotina şêx re şêxan te gotin.

Ola êzidîtiyê ji aliyê kevnbûne xwe ji dema medan ve jî berjêr diçe. Dema musulmanetiye de jî şêxîti heye û bi pêşketineên olî yên ku çêdibin re xwe mazin û bi bingehe dike û berdewam dike. Her weha divêt mirov vê bêje, bi wateya xwe ya dîrokî û civakî re baş û qenc şirove bike. Gava ku bi musulmanetiye re şêxeti dest pêşketinê dike êdî bi vê bêjeyê re ew gotin û wate ku pê re heyî û di nav civakê de bi pergale, bi reng û gotina musulmanetiye, hêbûna xwe berdewam dike. Bi vî awayî re gotina musulmanetiye jî, li Kurdistanê hê zû û mazitir pêş dikeve. Bi vî awayî pêşketina musulmanetiye re ku mirov şiroveyeke çêke, wê ev şirove xwe di nav civakê de ji civaknasiye (sosyolojîkî) ve bide ber çavan. Di van pêşketin û domanan de ew bêje û pêşketinên pê re ne, xwe gelek qihanek û belanan dide ber çavan. Bi vî awayî re ji aliyê olîtiyê û civakzaniyê ve ew bêje divêt li gor kêrhiya xwe were dîtin û şirovekirin.

Mihemed û seydayê wî li nig şêx demêke direj dimînin. Mihemed bi feqî û sofîyan re jî dirûnihê û dipeyivê. Mihemed dema xwe bi bêhtirî her weha bi feqî û sofîyan re û bi hinek mirov din, yên ku di nav civatê de xwedî rêz in re, dibuhurêne. Di wê demê de jî bi hesandina mirovan jî gelek tişt fêr dibe. Gotinên herêmê yên weke çîrok û dîrok û jiyangotinên mazinan dihesêne û li kêretiya wan jî diraweste. Ji wan jî gelekî tiştan fêr dibe. Di nav gotin û çîrok û dîrokan de her weha ku dihisand, li ser Cizîra Bota û zanista ku tê de ye jî gelek gotin dihatine gotin di nav civat û civakan de. Evçend mazin û bi awayekî xweşik dihate gotin ku di dilê mirov de cih digirt. Mîretî bi zanebûnê re têt gotin bi nave Cizîra Bota re. Her mirov ku dixwand dixwest ku ji bo zanista xwe mazin bike û di zanista xwe de kêr bibe, di dilê xwe de xwestekeke mazin diparast ku ji bo ku here

Cizîra Botan. Mihemed her weha li nig Şêx û di mala Şêx de hê bêhtir bûbû xwedîfahm. Ji gotin û axiftinên di serê xwe de sûreta ku bi gotin li Cizîra Bota re dihate gotin wî jî xweş û mazin bi xwe re çêkiri bû. Mirov ku xwe gihandibihêne Cizîra Bota weke ku xwe gihandibihêne evîndariyekê. Bi xwe gihandina Cizîra Bota re ji bo pêşketina hizir û xwe gihandinê hê gelek zanistivanan jî mimkun dibû. Di rê de çûna Cizîra Bota ve weke çûna rêyeke ku di nav dîrokê de bi meşê re xweşerê dihanî ser zimên. Mihemed gava ku di nav civakê de li mirov dihisand, didît ku hinek mirov ji wan mirovan çawa behsa çûna xwe ye Cizîra Bota bi can û dil dikirin. Ku behsa Cizîra Bota dikirin weke ku behsa evînê, evîndarekî bikin ku wilo xweş bi dil, hest û zane behs dikirin. Mihemed jî ji bav û kalê xwe pêşîkê derheqê Cizîra Bota de bûbû xwediyê hinek hiskirinan. Cihê mala bavê dayika wî jî hinekî ji Miksê wîr ve bi aliyê Cizîra Bota ve dima. Ji vî aliyê ve jî hinek hesandinên wî hebûn. Dayika wî jî jê re behsa wan herême dikir. Bi hesandina gelek gotinan re gelek gotinên ku berê ji dê û bavê xwe hîs kiri bûn û ji seydayê xwe hîs kiri bûn di wê kêlikê de di serê wî de divejinîn. Her weha bi vê vejînê re Mihemed di serê xwe de bûbû xwediyê wêneyekî ku baş û mazin a der heqê Cizîra û çûna Cizîra Bota û hebûna wê ya dîrokî. Bi wan temenan re Mihemed di serê xwe de dikete hizir û fikaran de. Her weha ji aliyê naskirina herêman û çirok û dîrokên wan ve û ji aliyê naskirin û dîtînan mazin ên wan herêmên ve jî bûbû xwediyê dîtînan û zanîname mazin li nig mala Şêx. Her weha divêt mirov bêje ku bi çendî ku ew bû bû xwedî naskirin û hizirbûnaka mazin, evçend jî bi zanebûn û hizra xwe re û bi hizir re ye ku dihate ser zimên, bingehê baş û mazin bi xwe re çêkiri bû. Li nig mala şêx gelek mirov êdî bi navê Feqiyê Teyran bang dikirinê. Ew êdî bûbû Feqiyê

Teyran ku bi teyrikan re dipêyivî û ji aliyê mirov ve her weha dihate naskirin. Piştî ku şêx bang kiri bû bi navê Feqiyê Teyran êdî mirov jî digotine wî Feqiyê Teyran. Her weha navê wî bi zanebûna wî re û bi gotinên Şêx û mirov re bûbû Feqiyê Teyran. Mihemed bi vî awayî jî nig şêx ne tenê bi navê Mihemed vegeriya malê. Her weha bi navê Feqiyê Teyran vegeriya bû mala xwe. Lê bêguman divêt mirov bêje ku her weha bi çêbûna nave Feqiyê Teyran jê re seydayê wî û şêxê wî xwediyê gotin bûn. Bi vî awayî di demên xwe yên pêş de hevalên wî yên xwendevan jê re navê Feqiyê Teyran bang dikirin. Bi vî awayî nave Feqiyê Teyran jê re dibe navê wî yê jiyanê ya herî mazin. Navê Feqiyê Teyran bi taybetmendî û zanebûna xwe re, xwe dide hildan bi mirov re. Mirov her weha ew xwedî taybetmendî û zanebûn didîtin. Bi vî awayî re Mihemed demên xwe yên ku li nig malê Şêx bi seydayê xwe re diborîne êdî divegere malê bi seydayê xwe re. Mihemed her weha bi awayê ku diçe nig Şêx û bi awayê ku ji nig Şêx divegere malê demên ji hev cihê dijî. Çawa ku diçe her weha ne vedigere malê. Gava ku vedigere malê, weke navê wî ye ku hildayî Feqiyê Teyran di serê wî de jî bi hê hizirnên din re, ji nig şêx divegere malê. Zanebûn di emel de di kesayetiya xwe de pêş ve dibe. Di wê demê de ye ku li nig Şêxê xwe dimîne, de ha mazitir hizra serê xwe mazin dike. Mihemed her weha gotin û zanebûn û evîna dilê xwe hê mazitir û bi hizirbûntir û zanebûntir û fahmbûntir dike. Zanistvanek her weha bi nave Feqiyê Teyran di nav xalke de kad dide.

II

Ro hêdi hêdi derdiket û tîna xwe dida li ser xelkê. Xelk jî ji nûke dest bi rabûna ji nav ciyan dikirin da ku herine kar û barên xwe yê rojane.

Mirov ku xwedî kar bûya, diviya bû ku hinekî zû rabe da ku bikaribe bi kar û bar zû bigihêne. Jin hê zû dirabûn ji nav cihên xwe ji bo kar û baren xwe yê rojane. Ji ber ku sewalên wan bi çûyina çolê û divîbû ku bihatine dotin berî ku herin. Hinekan jî hê ji êvarî ve sewalên xwe didotin. Ji ber vê yekê jî di sibehê de ne gerek bû ku wan cereke din bidoşin. Bêguman dîsan di çûnên nav sewalên xwe de û dimeyizandin ku ka ma tiştê ku bikin heye yan jî nîn e. Her weha çûyin di jiyana xalkê de weke berpirsiyariyeke xwezayî xwe dida ber çavan. Mirov ku hê hemûken ne rabûbûn sewalên xwe dibirin û diçûn mêrgan. Jin jî di malên xwe de dest bi kar û barên malên xwe dikirin. Peya jî karên ku kiri bana li malê dikirin yan jî li ser benderan de ku hebûya kar û barên xwe ve dirabûn. Yan jî diviya bû ku di dema xwe de av bidana tayeran. Mirov ji bo tayeran jî av bidana cokên ku li ber tayeran ve diçûn, çêkiri bûn. Tayerên xwe jî nêzîkê hevdu çêkiri bûn û av di xatên cokan de kişandibûn nig tayerên xwe, da ku tayerên xwe pê av bidin. Her weha di wan cokan de bi ava ku dihat, mirov tayerên xwe av didan. Di tayeran de fêkiyên weke bacanên sor û reş, pîvaj, îsot, sîrik, dulmek û bi sinatiya re hê gelek tiştên din ku wan di tayera de çandibûn, hebû. Her weha diviya bû ku gelekî ji bo tayerên xwe agahdar bin. Mirov her weha bi ava ku di cokan re dihat bi dûrekan re tayerên xwe av didan. Ku yekî avkirina xwe xilaskiri ba, êdî riya coka tayera xwe qut dikir û bi qut kirinê re yê ku di rex de ne, coka wî digirt û bi ya xwe vekirinê re dest bi avdana tayera xwe dikir. Her weha jiyaneke xweza û ku gelek bûyinên bêxeber dihate jiyinê.

Ber bi nîvro re kar û barên ku bi ber sibehê ve dest pê kirine hew dibû. Êdî wê kar û barên din yê ku yê malê ne dest pê kiri ba. Her weha ev kar û bar jî weke hevîrkirine hevir û paqijkirin û

lihevdana nav malê bû. Di kar û barê rojêne de gava ku hê zû dirabûn, mijûlbûn bi sawalan re çê dibû. Sewalên ku diçûne çolê pê de, êdî cihên sewalan paqijkirin û pêvedankirin dihate kirin. Piştî paqijkirin û pêvedankirinê re hê ji êvarî de mastê ku hati meyandin dihate hanîn û dihate kirin nav meşkan de û dest bi keyandinê dihate kirin. Bi keyandinê re zarok jî hêdi hêdi ji xewa xwe ya şêrin dirabûn û dest bi şuştina dest û rûyên xwe dikirin û paşê jî taştê dixwarin. Ku taştîya xwe dixwarin êdî ew jî diçûn li nig dayika xwe dirawestiyan ta ku dayikê kayandin hew kiri bana. Dayika ku keyandin hew dikir ji meşkê dikir û dest bi valakirinê dikir. Zarok jî li hêviyê dirawestiyan. Êdî ew jî ji bo xwarinê hinekî dew û nivîşk li ser nênan didan. Di wê jiyana de nanê ku ji nûkeva tanûre derdiket hê germ û piştî keyandinê re dew û nivîşka li ser nênan çêjên xwe bi tiştêkî din re ne dida gûherandin. Ev yek weke teybetmendiyeke rojane xwe dide nîşandan. Piştî keyandinê re bêguman zarok jî dew û nivîşkê xwe yê li ser nênan digirtin û diçûn. Ev yek ji wan re weke diyarî kirineke bû ku kêf dide wan. Bi vê yekê re zarokan gelekî kêfxweş dibûn. Dilên wan şa dibû. Her weha ku tiştên ku dixwestin dihildan ji wan re di dilên wan de weke serkeftinekê bûç Zarokan her weha ku dew û nanên bi nivîşkê xwe dihildan û dixwarin û xwarina xwe ji hewdikirin êdî diçûn digehîştin hevdu daku bi hev re bileyîzin. Dilên wan pir xweş dibû ku tiştên ku dixwestin û dihildan. Bi vî awayî re weke dunya tev xweşî û rindî dibû. Zarok kefxweşî û dilxweşiya jiyana û malana bûn. Mirov ji wan ta ku dihat dilê zarokên xwe ne dihiştin. Lê gelek caran jî tistên li dê û bavên wan ne dihat, bi vê yekê re jî zarok bi dilşikestî dibûn. Vê yekê jî dilê dê û bavên wan diêşand. Bavek her dem dixwest ku zarokên wî tiştên jê xwest ew î bi cih bihêne. Ku ne hanîbana cih jî jê re dibû weke dilêşiyeye

mazin û ev xwe pê re dida xuyakirin. Zarok bi qadr û qiymet in. Weke ava zelal in û diltenik in. Di jiyanê de zarok weke hibrê ne. Ku tu ew diberdî di nav ava de û av jî bi rengê wê hibrê rengê xwe diguharîne. Zarok jî her weha ji tiştên ku hez dikin an jî dibinin, dibin xwediyê guhenrandinan bi xwe re di pêşketina xwe de. Ev yek ku li jiyanê tê meyizandin pir baş û mazin bi zarokan re têt dîtin.

Piştî ku keyandina meşkê jî hew dibe êdî di kar û barê rojane de kar û sûxlê hundurê malê dest pê dikirin. Di malê de her weha jin bi kar dirabû. Di nav bender û tayeran de jî mêr bi kar bû. Lê gelek caran jî li ser benderan de jin û mêr li nig hevdû kar dikirin. Gava ku genim dihate lihevkerin piraniya jinan li bêjîngan dixist. Piştî bêjîngan ji têr û nawalên ku hatine çêkirin û amadekirin jî, ji genim an jî her weha weke nîsk û nokên ji zad dihate tijîkirin û dihate barkirin û dihanîn malê. Gava ku genim an ji her weha weke nîsk û nokên ku dihanîn malê êdî vale dikirin en kewaran ku ji bo wan zadan hatiya amadekirin. Di vir de hêja ye divêt mirov bêje ku çêkirina kewaran jî karekî gelekî mazin bû. Ji bo çêkirina kewaran jî hûnerek divî bû. Kewarên ku dihatine çêkirin her weha bi salan genim di wan de weke xwe dima û xira ne dibû. Ewan kewar ji axa sor dihatine çêkirin. Ax pêşi dihate hanin û pişt re dihate neqandin ji zûgurên ku di nav de ne. Êdî piştî neqandinê, dihate hêrandin û pişt re weke ku bê meyandin demekê dihate hiştin. Gava ku ax dihate hêrandin hinek sorbûn û ka jî dikete nav de. Lê kayê ku di kete nav de jî bi taybet dihate amadekirin. Axlabe jî kayê nîskan an ji ya nokên di nav heriya kewaran bi kar dihat. Kayê genim jî piranî ji bo tenûran bi kar dihat. Piştî ku demek ew heriya ku hatî amadekirin dimîne êdî hinekî tirş dibû. Bi tirşbûnê re têt meyandin û xasa xwe distenê. Piştî ku xasa xwe stand êdî pê de dest bi çêkirina kewarê



têt kirin. Lê bi carekê an jî di rojekê de ev kar na yêt hewkirin. Her roj weke bostekê yan jî du bostan tê çêkirin ta ku baş hev bigre. Gava ku hewdibe jî divêt baş bi heriya rohn were sahikkirin û Pişt re were zuwakirin. Ku zuwa bû pişt re êdî weke agirekî biçûk tê de were kirin da ku qiyma xwe bistêne û qayim be. Piştî wan kirin û çêkirinan re kewar êdî dibe kewarekî temam ji bo ku bi kar bêt anîn. Piştî ku hati çêkirin jî ta demeke dirêj qeyimiya xwe bêhtir dike. Her weha di malekê de kewar û kadîn, kox û kulîn (metbex) weke ji bo zad û sewalan gelekî girîng bûn û ji bo vê dihatine çêkirin. Di malekê de her weha hinek beş bi hev re dihatine çêkirin. Beşên ku dihatine çêkirin jî hemû ji yên ku pêwendî bi wan re hebûn û ji bo berdewam kirina jiyanê girîng bûn, dihatine çêkirin. Bi vê yekê re ji bo jiyana mirov kahnî jî gelekî girîng bûn. Kahnî ne tenê ji bo ava dihate bi karhanîn. Her weha ji bo parastina hinek tiştên xwarinê jî bi kar dihat. Yan jî ji bo nigidandina tiştên xwarine bi kar dihate hanîn. Her weha ji aliyê gelek pêwendîyan de dibû bersiv ji mirov re. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku mastê kîsê gelekî xweş e û hinekî ji xweşbûna xwe di kîs de û di kahniyê de bi rawestîna re digire. Mastê kîsê kawra xwe her weha hinekî di kahniyê de bi nigidandinê re digire. Li ser mastê ku di kîs de hiştine re gelek çirok û gotin jî di nav xalke de dihatine gotin. Ava kahniya ji binê erde tê ji ber vê yekê jî nigidî, hênik, zelal û gelekî paqij e. Ava bîran her weha ne wilo bû ji ber ku di demên direj de dima di bîran de. Ji ber ve yekê jî ku ne ji zor e bihêne ava biran bêhtir li cihên ku kahnî lê hene bi kar ne dihate hanîn. Pêwendî pê ne dihate dîtin. Mirov pir girîngî dida paqiji û jiyana xwe di mala xwe de. Paqijbûn û nepaqijbûn jî her weha li ber çavên mirov dihate xuyakirin û mirov gelek caran ji hevdû ji ber wê hişyar dikirin ji bo lawûtandin yan jî her weha

nepaqijbûnê. Xelk her weha jiyaneke xwezayî bi taybetmendiyên xwe re û bi hebûna xwe re berdewam dikir. Di jiyana xweza de mirov dikari bûn xwe bigihênen hizra nû ve ji xwe re. Ji ber ku jiyana xweza ye wan bi xweza re dida hizirandin. Dîtin û gotina xwe dike bingeha hizran ku ji nûkevê werine dîtin. Lê bêguman xweza jî di vê heyamê de xwe dike bingeha dîtin û gotinê. Bi xwezayê re têgehîştina xwe dide ber çavan û pêş dikeve. Rastiyeka mirov jî ew e ku bi xwezayê re xwe bi wate dike. Ji ber vê yekê jî têgehîştina xwezayê ji bo mirov û pêşketinên wî girîng e. Xweza qatek ji jiyanamirov e. Gava ku li xelkê dihate meyizandin, ev yek hê baş û mazitir dihate dîtin bi wan re di jiyana wan de. Di jiyana rojane de keçik û kurikên ji yên ku li malê bûna yan jî gehîştibûna nig hevdû dîmen û dilê hevdû digirtin bi dîtina hev re. Bi hev re diçûn li bermalan digeriyan û her weha nêzîkatî li hevdû dikirin û bi dil û can li hev dikirin. Ciwan li çavên hevdû dimeyizandin û hestên xwe yên li hevdû ji hevdû re didane têgehîştin û digotin. Mixabin ku mirov li cihekî jin dibin ne mimkûn e ku di jiyane rojêne de li rastî hevdû neyên û hevdû ne bînin. Bi hev dîtinê re dilçûyin ser hev û dilketina hevdû jî çê dibe.

Di rewşeke weha de çavên Dîlber û Dilşad jî li hev dialiqin û hevdû dibînen. Dîlber keca agayê herêmê ye û bi xweşiketiya xwe bi nav û deng e. Ew keça serekê eşîra Zengê ye. Eşîra Zengê jî milek ji milê eşîra Babikan bû. Zengê milekî wê li herême Botanê ber aliyê Cûlemergê ye. Sorekê eşîrê wê demê digotinê de Haso Aga. Heso Axa yekî bi nav û deng bû. Lê wê kêlikê gelekî pîr bûbû û di nav ciyan de bû. Heso Axa mêrê du jinan bû. Jina wî ya pêşi sê kur û du keçik dabûn wî. Jina din jî xwediyê keç û kurekî bû. Dîlber keçeke xanim a Heso Axa ya duyemîn bû. Dîlber bi xweşikatiyê re bi nav û deng

bû. Mirov ku ew dîti ba gelekî ji xweşiketiya wê bi tesir dibûn û distailin. Gelek mirov ku xweşiketiya wê ditibûn û li ser dipêyivîn ji bo xweşikatiya wê digotin ku 'rohniya nazilê erdê bûye'. Xweşikatiyeke pir mazin li ser Dîlberê hebû. Pora wê gelekî dirêj bû. Ew bi xwe re ji peyakî ne kin bû. Milikên xeftana xwe ji aliyê dirêj ve li paş xwê ve girê dîda û pora xwe jî di ser de berdida û desmala tenik ya ciwanî di ser porê de diberda. Rûdana wê hinekî fireh bû. Gava ku mirov li rûyê wê dimeyizand ciwaniya ku mirov didît mirov ji çavê xwe bawer ne dikir. Her weha yeka şareza dihate xûyakirin. Gava ku li rûdana wê dihate meyizandin rûdana wê jî bi çavan, hani û rûye wê yê esmer bal dikişande ser xwe. Gava ku li dûrên xwe dimeyizand gelekî bi kêf û hezkirin dimeyizand. Her weha gelekî xweşik bû û çavên gelek mirov ji li ser wê bû. Lê çavên wê tenê li yekî bû. Ew yek ji kurê mamê wê Dilşad bû. Çavên wê jî kurmamê wê Dilşad pê ve çî kesek ne didîtin.

Bi çendî Dîlberê Dilşad jî ji aliyê lihevhatina xwe ve deng dabû. Mirovê ku ew didît gelek bahsa wî jî dikirin. Dilşad yekî aliyê mêraniya xwe ve gelekî dihate gotin û behsa wî dihate kirin. Dilşad ji aliyê rûdana xwe ve yekî gelekî ciwan û sipehî dihate xûyakirin. Çavên wî bi rû û simbêlên wî gelek bal dikişand ser xwe de. Yekî hinekî dirêj jî bû. Hê ji nûke ve simbêla wî derdiketin. Lê wî ji simbêlên xwe berda bûn. Simbêlê wî bêhtir ne stûr û ne jî zirav bû. Lê bi wan simbêlan re û bi wan çavên xwe yên ku bala mirov dikişand ser xwe, her dem diçû ser wî ku ew didîtin. Hespêkî wî yê sipî û manek hebû. Hespê wî gelekî rehwal bû. Ku li ser hepê xwe sûwar dibû û wî hespê xwe dida bazdane tu kesekî ni dikari bûn xwe wî li ser hesp bigihêndanê. Gelek caran bi ciwanen ku wêke wî bi ciwanan re li ser haspan bi bazdanê re didana ber hevdu. Lê yekî ji

wan ciwanan jî ni dikari bû jî wî bibuhurandiban. Her weha bi sûwarbûna xwe jî yekê bi hûner bû. Ji wan aliyan ve mirov pir caran ew weke nimûne didane nîşandan di nav hev de. Malbata Dilşad jî ji aliyê malbatîyê ve digiha malbata Dîlberê. Bavkalên wan dibûn bireyên hevdû. Lê di nav wan de galegal çêdibe êdî ji ber wê yekê ji jev dûr dikevin. Lê mirov dikare bêje ku Heso Axa ji wan re pir baş bû. Aliyê malbata Dilşad jî ne xirab bû ji wan re. Her weha dest bi ser hev çûyinê kiri bûn. Malbata Dilşad ji aliyê ku mala Heso Axa ku lê bêhtir jev ne dûr bû. Wêke qederekê bi lingên mirov dikari bû xwe bigihane nig wan bi meşê re. Mirov ku li herêmên diman bêguman divêt mirov bêje ku bi ser hev de diçûn, ji ber ku ehlên hevdu bûn û gelek ji bi wate ne dîtin ku bi ser hev re neçin. Ji ber vê yekê û ehlebûn û hev naskirinê jî qasta hevdû dikirin. Malbatan her weha ji ber hinek peyvan ji hev qut bû bûn. Lê di rewşên mazin wêke di êrişên li wan de, li nig hevdû bûn. Her weha her dem piştta hevdu digirtin. Lê wêkê din jî kem bi ser hev de diçûn. Gelek mirov ji ber ku wan bihênen nig hevdû dest bi têkilîyên di nav wan de çûn û hatinê dikirin. Her weha mirov bi rêz ji xwe bi vî awayî di nav têkilîyên wan de xwe diwerdan daku wan bihênin nig hevdû. Mirov didîtin ku her weha ji hev dûr bûn û ev ji wan re dibû wêke dilêşiyekê. Dilşad bi xwe re gelek caran diçû cihê ku malapê wî li wir in û bi hevalên xwe re ji xwe re li wan deran digeriya. Hinek caran jî bi apê xwe re jî rû bi rû hati bû. Rêza wî li hevberê apê wî gelekî mazin bû. Dilşad di pîrozbahiyên de gelek caran diçû wê dere ji bo şahiyae ku têne kirin bibîne. Her weha ku pîrozbahiyên newrozê çêdibûn ew jî gelek caren diçû wî aliyê daku bikeve di nav pîrozbahiyên de. Di pîrozbahiyên newrozê de bi gelek awayan re pîrozbahî çêdibûn. Her weha weke lîstikên ciwanan,

lihevkombûnên mazin ên jinên ku ji xwe re xif dihênin nû çêkirine û li xwe kirine û xwarinên ku teybetî di wê rojê de hatine çêkirin jî hatine xwarinê bi kar dihat di vê roja teybet de. Ciwanên ku dibû êvar, êdî agir pê dixistin û bi êgir re diketine rêveçûnê de, ta ku digahane nav cihê ku ji bo lihevbûnê ku ji xwe re kifş kirine. Ku gihane wê dere pê de êdî ciwan keç û xort li hev digihane hevdu û govend digirtin bi hev re. Di wê roje de cilên hemûkan ji xifdihênin rengîn bûn. Bi gelek awayên din cilên ku li xwe hatine kirin jî hebûn. Lê divêt mirov bêje ku cilên hemûkan jî rengîn û gelêrî bû.

Dilşad jî di rojeke weha de ji aliyê wan gava di pîrozbahiyên li nig wan hinekî dimîne êdî pişt re bi se hevalên xwe re li ser hespên xwe sûwar dibin û rast û rast diajon aliyê din ê mala xwe ji bo ku li şahiyên meyzênin û yan jî bikevin di nav pîrozbahiyên de. Ji agirê ku hati bû pêxistin ji hawirdorên hemûkan ji bûbû rohani. Dengên ken û şahiyên mirov dikete nav hev de û dihate gûhan. Mirov her weha ji her derdên xwe ve xwe dûr dixist di wê roje de. Ew roj rojeke jiyane bû. Rojeke ku her kes bi hev re bi aştî bihen dor hev. Mirov ew bi kêf û şahî jin fikir. Bêguman her weha newroz ne tene rojeke şahiyê bû, divêt mirov bêje ku rojeke ku ew sala ku buhurî û sala ku wê were, bibuhure jî di nav xwe de kifş fikir. Weke serê salê xwe bi destpêkirineke nû bi wate fikir. Mirov di wê rojê de li sala hatî buhurandin, ku te de hatî jînkirin, li başî û nebaşiyên di jiyana xwe de dimeyizandin û şirove dikirin. Mirov di wê rojê de li pêşî û paşîya xwe baş û qenc dimeyizandin da ku ka me sala buhurtî çawa çû û ya were wê çawa here. Li gor salnameya ku mirov dijimart, divî bû di meha adarê de gava ku ji heftiya sêyemîn ta derketin di haftiya çaremîn de di roja yekêmin de pîrozbahî dest pê fikir. Li gor rojê, ev roj dibû 21'ê Adarê. Di 21'ê Adarê de pîrozbahî dest pê dikirin.

Lê salnameya ku ji dema medan hebûn, xwe her berdewam kiri bû di nav xelkê de. Li gor yê medî jî her weha gava ku dihate gotin 1 li gor ya zayînî (mîladî) jî dibû 14. Her weha dîrokek ji medan ve ta wê rojê hebûna xwe berdewam kiri bû. Bi vî awayî. Dilşad û hevalên wî bi hev re têne nav pîrozbahiyên ku têne kirin. Dilşad gava ku tê gelek mirov wî nas dikin û bi hev re dirûnên û ew dawêti rûniştinê kirin. Dilşad yekî ciwan bû û kelegerm bû. Her weha Dilşad yekî bi rûdan û nêzîkatiyên xwe yê zane, bala mirovên hawîrdora xwe dikişande ser xwe de. Mirov gelekî bala xwe didayê de. Lê dimeyizandin. Gava ku lê dihate meyizandin dilê mirov kef xweş dibû pê re. Dilşad bi çendî bi merxasî û rûdena xwe re bi deng bû, her weha bi hûnera xwe ya lîstikê jî bi hûner bû. Ku li hespê xwe suwar dibû, bêguman weke ku bi hespê xwe re bibe yek bi lêz û bez ji ber çavan winda dibû. Hespê wî gava ku hê cahnû bû, bavê wî dabûyê de daku ji xwe re mazin bike. Bavê wî gotîbûyê de 'ew cahnû yê te ye'. Ew jî li cahnûyê xwe xwedî derketibû û bi xwe re mazin kiri bû. Hesp li Kurdistanê bi du taybetmendiyan bi nav bûn. Teybetmendiya pêşi her weha bi serxweyiyê re dihate ser zimên. Teybetmendiya dî jî weke rûmetê dihate dîtin. Mêrekî gava ku dihate meyizandin, li hespê wî jî pê re dihate meyizandin. Ev jî divêt bû ku kevneşopiyekê bihêne. Gava ku cahnû hê biçûk e ta dayin û bi hev re mazinbûyin çêdibû ji ji gelek aliyên ve ji feda wê hebû ji wî mirove ku ew bi xwe mazin kiri re. Hasp wî çaxî gava ku ahl dibû têne xwediyê xwe bi ahlbûne xwe re baş nas dikir. Ev yek jî gelekî girîng dihate dîtin. Dilşad her weha xwediyê hespêki pir baş bû ku ji aliyê wî ve hati bû mazinkirin û ji aliyê wî ve dihate suwarbûn. Di vir de hêja ye ku divêt mirov bêje ku her weha baş û qenc hesp mazinkirin jî weke taybetmendiyeke baş ji bo ciwanan dihate

şirovekirin. Dihate gotin ku 'wî mirovî hespê xwe baş kedî kiriye. Têt wê wateyê ku mirovekî qenc e û mirov dikare jê hêviyê bike'. Hêvîkirin li ser beweriyekê bi kesayetiyê re xwe dide nîşandan. Bêguman careke din divêt mirov bêje ku ciwanên weha ji bo ku baweriyê bikişênin ser xwe, gelekî mazin tevdigariyan. Her weha bawerî bi xwe re rêz û mazinbûn dihanî ji ciwanan re. Mirovên ciwan jî wê bi vê yekê re bibûna xwedî nav di nav civakê de. Bi vê yekê re hêjayê gotinê ye divêt mirov bêje ku ciwanên pir tahb dide xwe daku her weha baş, qenc û bi taybetmendî wêrin naskirin. Mirov bi taybetî bi gotinê re ji bo ciwanan dihanî ser zimên. Dilşad bi vî awayî ji aliyê hevalên xwe ve û ji aliyê mazin en xwe ve pir baş û mazin dihate naskirin û pêşwazîkirin. mirov mazin her weha ew nirxdayina ji bo ciwanan û bi hanîna ser zimên ji wan re û ji bo ciwanan bi xwe re dayina rûniştandina taybetmendî yên kesayetiyê, wate digirt. Mirovê ciwan bi bêhtirî bi taybetmendiyan xwe re li ber çavan dihatine girtin. Mirov li wan û taybetmendiyan wan dimeyizandin û derbarê wan de biryara xwe diden. Di vir de divêt mirov bêje ku yên ciwan, bi xwe re divêbû derbihêne herêkirin di nav mirovên mazin de. Dilşad ji wan aliyan ve xwe dabû herêkirin. Mirov ku ew nas dikirin û ditibûn baweriya xwe pê hanî bûn. Ji ber vê yekê jî bû ku çawa hati bû nav şahiya mirovê mazin ew dawati rûniştinê kirin di nav xwe de. Ew bi xwe mirovê ji mala Axa bû, lê bêguman mirov bi bêhtiryi li wan taybetmendiyan ku pê re ne lê meyizandibûn. Dilşad gava ku têt nav şahiyê û mazin ew dîtîn, wî dewatî rûniştinan kiri bûn hingê. Dîlberê jî li pêşiya wî bi keçen hevalên xwe re li nêzikê wî rawestiya bû. Ew jî ji cihê xwe bi gavên hêdî berê xwe ber bi wan ve zivirand û ber bi wan ve çû da ku here li nig wan rûne. Gava ku berê xwe dizivirîne ku here rûne, di wê

heyamê de çavên wî bi hêbûna Dîlberê dikeve. Dîlberê di nav hinek keçên hevalên xwe di nav şahiyê de rawesta bû. Gava çavên Dilşad bi Dîlberê ketin êdî di wê heyamê de Dîlberê jî rûyê xwe rakir ku li pêşiya xwe meyizêne ew jî di wê heyamê de bi Dilşad re rû bi rû hat. Dîlberê weke çar pênc gavan ji Dilşad dûr bû. Lê gava ku rû bi rû hati bûn, baş li hevdû meyizendi bûn. Dîtina wan pir mazin çûbû ser hevdû.

Dilşad di wê heyamê de ji ber Dîlberê dile wî pir diguşiye. Gava ku çavên wî bi wê dikevin re êdî ew xwe ji bîr dike ku wê çûbûna nig mazin ên wê rûniştibana. Hızir û ramana wî diçe ser Dîlberê di wê demê de. Dîlberê pir xweşik bû. Dilşad ji pir spehî bû. Herduyan jî hevdu dîtibûn û di wê heyamê de çavên wan gava ku çûbû ser hevdû, çavên xwe ji hevdû qut ne kiri bûn, tenê hema wilo li hevdû meyzandibûn. Têne hema wilo di cihê xwe de rawesta bû û li Dîlberê dimeyizand. Dîlberê di nav hevalên xwe de bû. Dilşad jî li nig hevalên xwe bû. Di wê heyamê de rabû bû ser xwe ku here nig wan mirovên mazin û bi rêz rûne. Gava ku her weha rawesta bûn, hevaleyê wî têgehîşt ku tiştê bi Dilşad bû. Her weha ew jî li xwe zivirî û dit ku Dîlberê li heberê wî ye û li hevdû dimeyizandin. Gava ku hevalê wî ji meyizend dît ku Dîlberê çend xweşik e û li hevberê wî rawestayê û li wî dimeyizêne. Dilşad ji xortekî pir wêrek bû. Lê wê kêlikê ku mirov lê dimeyizand, dihate têgehîştin ku li ber xweşikbûna Dîlberê xwe win kiri bû. Dîlberê gelekî hêja bû. Keça axayê herêmê bû ji her aliya ve bi nav û deng bû. Roja xweşikan newroz bû. Ji evîna dilan re hevdîtin hebû bi Dilşad û Dîlberê re. Roja xweşikbûnê bû newroz. Hızrek di serî de bû lê di dil de xwedî awaz bû. Ji bo Dîlberê evîn bû. Ji bo Dilşad evîn bû. Ji dîtîna dilgerm bû. Ji meyizandina çavan kal bû. Lê hebû di neqabine de evînek ji dil



dîtina wê bû. Hizra zanist a mazin bû li nivîs, digot ew evîn e xwediyê rûmet e dilîn e. Lê çi kesek ne dikare bêje ev nîn e ji ber ku hê ji nû ve diket jîn e.

Dilşad û Dîlberê gava ku çavên wan bi hevdu ket, êdî pê de hema wilo li hevdu meyizendibûn. Li aliyê Dîlberê jî keçeke hevalên wê kifş kiri bûn ku li Dilşad dimeyizêne. Wan ji gava ku kifş kirin êdî wan jî serê xwe zivirandin û lê meyizandin. Gava wan keçên bi Dîlberê re dest bi meyizandinê kir. Dilşad jî êdî weke ku fihêt bike serê xwe kire ber xwe ve û bi çavan re li ber xwe li erdê meyizand. Gava ku her weha çêbû êdî Dîlberê jî bi hevalên xwe re kar kirin ku herin. Lê Dilşad weke ku careke din di wê heyamê de wêra bide xwe, serê xwe rakir û bi ber wan ve çû. Hevalên wî di cihên xwe de mabûn. Wê kêlikê ji wan çî gav û lêbat ne hatin. Gava ku Dilşad ber bi Dîlberê ve çû, hevalên wê jî hinekî xwe bi paş ve dan weke ku wê bi tene bihêlin di wê heyamê de. Dilşad bi dilpêriyekê re giha nig Dîlberê û li hevberê wê rawestiya. Di heyamê de Dîlberê jî bi fihêt bû. Serê xwe car bi car dikire ber xwe de û car bi car jî dirakir li ber wî li rûyê wî dimeyizand. Lê ew jî gelekî bi dilpêr li hevberê wî rawestayî bû weke peykerekî ku ji dilan re hatî çêkirin bû. Gava ku gihana dahma hevdû her weha weke kêlîkekê li hevberê hevdû bedeng mabûn. Pişt re Dilşad dest bi gotinê kiri bû û gotîbû 'slav'. Dîlberê jî bersiva wî da tene kurt: 'silaw ji te re jî..' Dîlberê berê carekê ew dîtibû. Lê wî hê gava ew biçûk bûn ew dîtibû. Lê gava ku wê ew dîtibû nas kiri bû. Dîlberê ji hevalên keçên ku pê re ne, wê gavê ku çavên wan çûbû ser hevdû re jê re gotîbûn ku ka ew kê ye. Hinekan ji hevalên wê ew nas dikirin. Dîtibûn ku Dîlberê li wî dimeyizêne wan jî jê re gotîbûn 'ew kuremê te Dilşad e'. Dilşad li ber wê kar kir ku bipeyive lê ew cara pêşi bû ku bêjeyên wî di nav

lêven wî de bi germ û zor derdiketvin. Dilpêriyekê mazin di dilê wî de hebû. Lê di dilê Dîlberê de jî dilpêriyeke mazin hebû. Dilên herduyan her weha bi dilpêriyekê re germ bû. Di serê herduyan de jî dibit ku ji bo hevdû gotina wan hêbûn, lê ne digotin. Gotinên wan yê ji nav lêvên wan derdiketin ji hinekî bi zorê derdiketin. Ku ji hev re tiştêk gotiban, di wê heyamê de çi bigotina gelo? Têne hama wilo ji çavên li hevdu di meyizadin. Dibit ku tiştên ku ji hev re digotin bi meyizandinekê re bi çavan re digotin di wê kêlîkê de. Dîlberê li hevberê Dilşad rawesta bû. Lê gotin ji devê yekî ji wan ne derdiket. Dîlberê ji ber çavan re weke li hevalên xwe meyizêne gava bi tihêlê xwe re avêt lê dewama wê gavê ne hanî. Hevalên wê di rex wê de lê piçekî jê dûr ve rawesta bûn. Pişt re wê jî di wê heyamê de kar kir ku here nig hevalên xwe ve. Weke ku tiştêkî wê ji bo neçûnê li wir zant kiri bû di cihê xwe de mabû ne diçû. Li xwe giha rihek da xwe ku here, lê dîsan lê zor hat. Her weha wilo li Dilşad jî dihat. Ew jî di rewşeke ku weke wê de bû. Lê Dîlberê lê divîbû here nig hevalên xwe. Li ser lingan kar kir ku berê xwe bizivirîne, bi çûnê re lê çavên wê ji Dilşad qut ne dibûn. Di wê heyamê de Dîlberê destê xwe da destê Dilşad û desmalka xwe ya destan ya ku sipî ye da destê wî û ji wir bere xwe da nig hevalên xwe ve û bi qavzên biçûk ji wir, li nig Dilşad vaqeteha çû. Dilşad gava ku ew çû li paş wê ve weke heyamekê ma û lê meyizand. Ku Dîlberê çû ji nig Dilşad vaqeteha êdî hevalên wî jî li hevdû meyizandin û çûne ber bi wî ve. Gava ku çûn û gihan nig wî, hinekî bi ken li ruyê Dilşad meyizandin. Dilşad weke ku fihêtkê li hevberê hevalên xwe di wê heyamê de serê xwe kire ber xwe de û li erdê meyizend û pişt re careke din serê xwe rakir û li wan bi rûyekî sor meyizand. Rûye wî ji fihêta wî sor bûbû. Ew sê hevalên bûn. Hevaltiya wan ji dil û ji zarokatiyê bû. Weke bira

li hevdu dimeyizandin. Bi hev re diçûn nêçîrê û ciya. Lê ku li hevdû jî dimeyizandin. Hevalên wan yê biçûk li Dilşad meyizand û bi kenekî dilxweş jî Dilşad re got 'we dil xwe da hevdû'. Dilşad ti bersiv neda vê gotina hevalê xwe yê biçûk. Lê dilê Dilşad di wê heyamê de hawirdora xwe û dunya weke ku ji bîr kiri be, xwe di ruyê wî de dide nîşandan. Ruyê Dilşad weke ku xûhdan girtibe dihate xûyakirin. Lê saqe jî ne li gor wê bû ku mirov bike ku xûhdan bigre. Saqeyekê hênik hebû. Mirov hemûkan jî ji ber pîrozbahiyên newrozê ji derve bûn. Her kesek li wê rojê bi cilên xweşik bû. Çi kesek jî kêr ne dihate xûyakirin. Ew roj bû , roja ku mirov xwe xweşik kiri ba. Mirov jî her weha xwe xweşik kiri bû û derketibûn derve û bi hev re şahiyê dikirin. Mirov gelekî bi cilên xweşik bûn. Hemawiyên li ser jinan ku hawîrdorên wê noqakiri û nexşekirî dihatine xûyakirin. Di hûndure salêkê de mirov ji ber kar û barên wan demên xwe yên vala ji bo amadekirinê re bi kar dihanîn û dibuhurandin. Wê rojê jî her weha roja ku ji hev re tiştên hatina çêkirin wêrin nîşandan bû. Ciwanan jî her weha bi cilên ku gelekî xweşik hatine amadekirin hati bûn qada pîrozbahiya newrozê. Her weha mirov hêbûna xwe didane nîşandan li ber çavên hev, bi xweşiketiyan xwe re û kirinên xwe re. Xweşikbûn, dilxweşbûn, dilşahî û her weha rihcanî gelekî mazin xwe dida nîşandan li ber çavan bi şahiya newrozê re û bi mirov re.

Dilşad gava ku Dîlberê çûbû Êdî di cihê xwe de mabû. Hevalên wî jî gava ku hati bûne nig wan weke heyamek li nig rawesta bûn bi bédengî. Dilşad di dilê xwe de jîn dibû wê kêlîkê. Haya wî ji dunyayê ne mabû. Dewetiya mazin ku jê re şandibû, ji wê kêlîkê li hişê wî ne mabû. Hevalên wî weke ku wî ji xewê rakin deng danê. Hevalê wan yê mazin gote wan 'divêt em herin rûnên li nig mazinan. Dewetî ji me re şandibûn' Piştî vê gotina hevalê wan a mazin, êdî ew jî bi hev

re dane xwe û çûn nav cihê mazinan ku lê rûniştibûn. Gava ku çûn mirov hûrmet û rêz dana wan û ew keremê rûniştinê kirin. Di wê heyamê de ji dûrî ve çavên Dîlberê jî li ser wî bû ku li nav mazinan çawa bû û mazinan çawa rêz didanê de. Dîlberê tenê ji dûrî ve rawestiya bû û hema wilo li Dilşad dimeyizand. Çavên wê li ser Dilşad bûn. Wê kêlîkê jî, ji dûrî jî ketibû dilê wê ne dixwast ku wî ji ber çavên xwe dûr bixe û here. Lê divîbû bi hevalên xwe re gavê xwe bi avêje. Ni dikari bû bê wan gavê xwe biavêje ji ber ku ji wan vaqeteha wê bi tenê maba. Wê ji ne dixwast bi xwe re bimêne bi têne. Di nav şahiya newrozê de bi tenêmayin ne baş dihate dîtîn. Di şahiya newrozê de çi kesek ji çi kesekî ne biçûk û ne ji mazitir bû. Dilşad di wê heyamê de ne di kifşê de bû ku Dîlberê ji dûr ve li wî dimeyizand. Lê Dîlberê bi dilxweşiyekê lê dimeyizand û di dil de jî ji xwe re bi xwe re dikenî. Bi ken re di dilê wê de xweşî û di rûdana wê de jî geşî xwe dabû ber çavan. Rûdana wê bi hinarikên xwe re sor bûbûn. Lamên xweşik di hinarikên wê de çêbûbûn. Demên ken di ruyê wê de xwe didane derve de. Ji dûrî ve gava ku li Dilşad dimeyizand didît ku çend rûgeşî pê re hebû. Çavan ew hinekî mazin bû lê ne bêhtir mazin bû. Simbêlên wî hê ji nûke ve derdiketin ne bêhtir mazin bûn. Lê ji dûrî ve, wan herdu taybetmendiyên wî xwe didane kifşkirin li ber çavên mirov. Cilên ku li xwe kiri bûn pir lê dihatin. Her weha pir lihevhatî bû. Bi meyizandina li xwe dilê mirov xweş dikir. Kêfek dikire dilên mirov. Her weha ji rûdana wî ji başbûna dilê wî xwe dida der. Gava ku li hevberê Dîlberê rawesta bû Dîlberê bi hinarikên xwe re pir sor û fihêt bûbû li ber wî di wê heyamê de. Her weha Dilşad jî bi fihêt bû. Gava ku Dîlberê ji dûrî ve li Dilşad dimeyizand weke ku disa her weha wilo lê were lê dihat. Wê kêlîkê ku Dîlberê lê meyizand û ta Dilşad jê ne bû jî disa weke

ku li hevberê wê be û lê meyizêne hinarikên wê sor bûbûn. Lasê wê gelekî germ bûbû. Ji rûdana wê her weha ev yek pir baş dihate têgehîştin. Dîlberê miroveke her weha bû ku dilê wê pir mazin bû. Dilê wê ji nuha li ber kuramê wê bû. Di nav şahiyê de ew bi şahiyekê re bû ku di dilê xwe de ew bi têne wê şahiya jiyanê dibû. Di dilê xwe de gelekî kêfxweşiyeka mazin xwe dida der. Lê fihêtbûn ji wê kêlîkê pê re hebû û bê ku hinekan li hevberê wê hebin ku ji wan fihêtke. Gava ku di dilê xwe de car bi car geş dibû, weke ku di hinek kêlîkan de xwe ji bîr bike bi ken diket. Pişt re ku demek çû, êdî hinekî rawesta û weke ku hinek mirov ji dûrên wê li çavan wê meyizênin lê dihat. Wê jî bêsedem li dûrên xwe dimeyizand. Lê sedemekî wê hebû ku ew her weha li hevberê hawîrdora wê bi bal dikir. Lê sedema wê têne bi wê re bû. Wê xwe di nav şahiyê de wê kêlîkê weke ku xwe bi tenê bibine lê dihat. Ku çavên xwe miç kiri ba û çi kesek li vir li hawîrdora min nîn e ez bi têne me di şahiyê de û şahî her weha hizirîba ma galo wê ji wê re wilo bibûya? Ev çend bi xwe re bû ku di nav şahiyê de ta wê jî çi kesekî ne mabû di wê heyamê de. Dilê wê bi kef bû lê ni dikari bû wê bi yekcarî bihêne ser zimên ji ber ku fihêt dikir. Dilê wê bi şahî bû û bi wê şahiya xwe re bi têne bi xwe re bû di nav evçend mirovan de. Kêfxweşbûna di dilê wê de ew ji dunyayê dûr û dûr biribû. Di hundurê xwe de diçû û diçû weke ku di riyekê de be û ew rê bêdawi be, bi awayekî bi dil têde diçû û diçû. Lê ji dil bû. Jînbûnên wê yên wê kêlîkê hemûkan jî ji dil bûn. Di dilê xwe de ew di rastiyê de bû. Wê xwe her weha wilo didît. Dilê wê safi bû weke rûdanên wê yên ku ber bi sipî ve diçû. Hestên wê ew di dest kiri bû. Di nav şahiya pîrozbahiyê de hem xwe bi têne didît û hem jî ne bi têne bû. Bi hest bû wê kêlîkê hem jî gelekî bi hest bû. Dilê wê bi wê hestbûna wê re şa bû. Şabûna wê jî mazin

bû. Bi wê şabûna dilê wê re ku li mirov dimeyizand, wê ji şabûna dilê wê, zanîn û wan mirov jî bi wê re wê şabûna wê şa dibûn. Mirov li hawîrdorên wê hemûkan jî bi şabûn. Dengên kenên wan bilind bû. Wê kêlîkê her kesek bi şabûna xwe re li ya dorên xwe û li yên nig xwe dimeyizandin. Şabûn şabûna newrozê bû. Ew roj roja newrozê bû. Her kesek şa bû bi dilê xwe re. Her kesek şabû di dilê xwe de. Evîndarên wê roje li hevdu dimeyizandin bi evîne re. Ronahî û evîna di dilan de xwe dida derve de bi wan re. Di dilê her kesekî de şahiyek hebû. Lê di dilê Dîlberê de şahiyekê gelekî mazin hebû. Dilê wê xwediyê şahiya mazin bû. Newroza wê rojê newroza wê bû. Mirov ku dil digirtin dihate meyizandin, dihate dîtî ku mirov bi şahî di destê hevdu de govendê dikir. Mirov di dîlanê de jî bûn gelek ji wan yên ku hîsê hevdû kiri bûn. Hemûkan jî yên ku dilên wan ji bo hevdu diavêt bûn. Di dîlanê de di destên hevdû de li govendê bûn. Hemûkan jî yên ku govend dikirin bi şabûn û bi şabûna dilên xwe re li hawîrdorên xwe dimeyizandin. Yên ku li evîna xwe dimeyizandin û yên ku li hevalên xwe, yên ku gelekî ji yê gelekî hez dikir dimeyizandin. Hemûkan jî wê kêlîkê li nig hevdu bûn û deste wan di deste hevdu de bû bi şahî û kêfê re di newrozê de bûn.

Şahîyên newrozê bi gelek awayan re hêbûnên xwe berdewam dikirin. Mirov di wê rojê de diçûn nig hevdu û bi hev re dipêyivîn û didan û distandin. Piştî şeva newrozê ya pêşi re êdî mirov gelek diçûn herêmên din jî ji bo mêhvandariyê li nig yên ku nas dikirin. Her weha şahiya newrozê weke hefteyekê hêbûna xwe berdewam dikir. Bi mêhvandariyê jî ji aliyê mala bavê Dîlberê jî gelek mirov diçûn aliyê mala bavê Dilşad li nig yên ku nas dikirin. Di wê roje de jî gelek ji hev xeyda bûn an jî her weha nêzîkatiya weke berberiyê di nav wan de hêbûn, gelek mirov ji wê rojê gerek nêzîkatiyên xwe

ne buhurtibin piştî newrozê re. Yên ku bi hev re ne didan û ne distandin ji piranî di wê rojê de dest bi peyivtina di nav xwe de dikirin. Ji pirsgirêkê re her weha lihevhatin di wê roje de weke taybetmendiyeke xwe dida ber çavan di nav mirovan de. Di şeva pêşî ya newrozê de hinek nêzîkatiyên girîng hebûn. Di şeva pêşî de di newrozê de ji newroza berê ta wê newroza di hundurê salê de, ciwanên ku zewîbûn piranî li pêşiya pîrozbahiyên cih digirtin. Ev yek jî weke kevneşopiyekê xwe dida ber çavan ji bo wan. Di wê newrozê de jî yên ku wê ji nû ve bizewîcin an ji karê zawêce dikirin, ji tevî wan dibûn. Wateya vê yekê jî ji bo wan ji nûke ve gavavatina ji jiyane bi zewac bû. Piştî zewacê ji newrozê pêşî jî ji wan re girîng dihat. Her weha dihate şirovekirin ku ew newroza pêşî ye ya bi zewacê ye, ji bo wan e. Yên ku di salê de ji zewicî bûn xwe didane pêşî ji ber ku dixwestin xwe weke maliava bidin naskirin û ber çavan. Her weha ev yek jî ji bo wan girîng bû ku ji ber ku bi xwe nîşandanê re xwestina rêzê ji mala xwe re dihate ser zimên. Mirov jî êdî wê rêzê dabana wan weke ku xwedî mal in. Newroz her weha di nav civakê de hêbûna xwe ye komelgeyî xweş dida ber çavan. Komelatiya newrozê bi pêşketin û hêbûna xwe re xwediyê hinek taybetmendiyan e. Ji aliyê civakî ve bingehekî mazin e ji pêşketine civakê re. Newroz mirov ni kare têne weke hinek mirov ku wêrin nig hevdu û şahiyêkê çebikin, şirove bikin. Bi bêhtirî jî divêt mirov bi civakê re şirove bike. Bêguman li Kurdistanê gava ku mirov civakê ji aliyê civaknasîyê û sincê ve şirove bike divêt mirov newrozê jî weke nêzîkatiyeke komelayetî û sinc di bingehe de şirove bike. Ji aliyê din ve jî newroz di kevneşopiyên ku di nav civakê de çêbûne bingehe e. Nêzîkatiya mirov bi newrozê re mazin dihênin ser ziman. Ji aliyê din ve newroz bi hêbûna xwe ye komelgehî, sincî û bi kevneşopiyên

ku di nav civakê de bi hizir e ku xwe avakirina pêrgaleke civakî ye, dide avakirin. Komeletiya newrozê her weha xwe bi wate dike di nav civakê de. Hizrên Kurdistanê yên olî ji xwe ji vê civaknasiyê ne buhurandine. Piranî xwe di nav wê pêrgala de bi wate kirine. Li ser wê bingehe li Kurdistanê xwe çêkirine. Her weha nêzîkatiyên Kurdistanê bi newrozê re divêt baş û qenc were têgehîştin da ku pêşketina wê were têgehîştin. Newroz di pêşketina xwe de ku mirov xwe bide têgehîştine wê mirov bibîne ku riheki bi hazar salan re di xwe de hatiya ser zimên. Her weha di civakê de xwediyê taybetmendiyan dema ku tê de tê jiyînê bi demên berê re yên ku divêt mirov têbigihê û bihêne ser zimên. Bêjeya newrozê ku têt ser zimên wateya serhildaniyekê bi xwe re têne ber çavan. Her weha divêt mirov wê mazin şirove bike û bihêne ser zimên. Lê divêt li gor dîroka wê mirov bihêne ser zimên ku ta ku wateya wê ya mazin were girtin.

Gava ku bi Dîlberê û Dilşad re bi şahiya newrozê dihate jiyîn û Lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku hebûneke mazin ji aliyê zanebûnê ve xwe dide ber çavan. Jinên ku ji aliyê cilan ve xwe xweşik girê dabûn û peyayên ku cilên nû li xwe kiri bûn xweşikatiyeke mazin bi şahiya newrozê re dihanîn ber çavan bi xwe re. Her kesek bi serê xwe re bû. Ji aliyekî din ve jî her kesek bi hev re bi şahî bû. Bi şahîbûna newrozê bi serxwebûnek re xwe dide mirovî. Ji aliyê tevgerên xwe ve mirov di newrozê de xwe ne dişidandin. Keç û xort, jin û mêr, bav û keç, dê û kur wê roje li ku derê jî bin, destên xwe digihandin hevdu û şahiya xwe bi hev re dikirin. Di wê rojê de ne çî bav û dê û ne jî çî keç û kur ne dixwastin ku bi têne bimênin. Di wê roje de bi tînemayin di dilan de xemgîniyekê çêdikir bi mirov re. Ji ber ve yekê jî kesekî ne dixwast



ku bi têne bimêne. Lê yên ku ji naçariyê bi têne maban jî, ji aliyê mirovên dûrên wan ve û yên mermalên wan ve bi têne ne dihatine hiştin. Bêguman divêt mirov bêje ku mirov di rewşên her weha de dixwastin bi ser mirov de herîn. Her weha çûyin hem weke kevneşopiyekê bû û hem jî weke berpirsiyariyekê jî dihate dîtin. Di nav civakê de mirovên dijiyan hemû didikari bûn tevî vê berpirsiyariyê bibin. Di vê berpirsiyariyê de çî ji destê kê hatiba dikirin. Ev kirin ji mirov re weke berpirsiyeriyeke bi rêzê dihate dîtin. Gava ku ji destê mirov tiştêk hatiba û ne kiri bana êdî weke mirovên bêberpirsiyarî dihatin dîtin. Çî mirov jî ne dixwast ku xwe weke bêberpirsiyarî nîşan bide. Mirovên bêberpirsiyar bêguman bêrêz dihatine dîtin. Her weha li kirinên mirov jî dihate meyizandin û biryar dihate dayin, ku ew mirov bi pirsiyar e yan jî bêpirsiyar e. Civak bi vê yekê re li ser pergala komelgehî ava bû. Dilşad jî gava ku dihate nav şahiya newrozê de û jê re rêz dihata nîşandan bi vê yekê ve jî girêdayî bû. Her weha bi vê yekê re girêdayî divêt mirov bihêne ser zimên ku kirinên wî di nav civakê de ew kiri bû miroekî bi rêz. Gava ku ne kari ba ne dikete çavên mirov de. Wî çaxî mirov jî her weha jê re rêz ne dide nîşandan di nava civakê de. Di wê nêzîkatiyê de kûr bû ku mirov rastiya xwe bibînen û li ser xwe bimînin. Ango her weha xwe bi vala ne berdane tiştê ku ji destê wan were bikin. Ev yek jî bi çendî ji bo peyayan wilo bû, ji bo jinan jî wilo bû. Jin jî di kar û barê malê de û di hevgirtin û tevlihevdana malê de jêhatî bûn divî bû were nîşandan. Pergala malan ji jinên jêhatî dihate xwastin. Diviya bû ku ew jî vê yekê bi cih bi haniyana. Jin ji rûmetê dihate dîtin. Her weha diviya bû ku rûmeta xwe jî bi parêzin. Mal wênaye mirovan e. mirov ku diçû cihêki yan jî li malekê dimeyizandin ka ma mirov baş e yan jî ne qenc e dihate şirovekirin

di wê heyamê de. Malê baş ji rûmeta jin û mer dihate jimartin. Her weha ev zanebûn ji demên kevn ve hêbûna xwe berdewam kiri bû. Bi vê yekê re li hev xwedî derketin ji aliyê civakê ve weke nêzîkatiyeke komelgehî jî divêt mirov şirove bike. Divêt mirov bêje ku civaknasiya mirov li pêş bû. Mirov li hev dimeyizandin û alîkarî didane hevdû. Weke nimûneyekê divêt mirov ser ziman ku li benderan di paleyîyê de bi dûran re alîhevdu dikirin weke kevnesopiyekê bû. Her weha kesekî di rewşeke zor de ne dihişt. Gava ku kar hat hewkirin jî her weha şahî jî bi hev re çêdikirin. Li nav benderan gava ku dihate ketin û diketine ber paleyîyê de hêlbestan ji hev re digotin û li hev vegerandin jî nêzîkatiyeke bi teybat bû. Di ber palayîyê de di gotinê hêlbestan de mêr li jinan vedigerandin, jin jî li mêra Jin li jinan jî vedigerandin û mêr jî li mêran. Gava ku ev yek çêdibû jî gelekî di dilên mirov de şabûn çêdibû. Gelek caran mirov ji ber ku her weha li gotina helbesten diçûn nav benderan. Çûna nav benderan her weha dibû ji bo kar û guhdarkirineke bi dilxweşî ji mirov re. Bi vî awayî jî ji bo gotina gelek hêlbestên civakê û dirêj hêbûn û dihatine gotin di rewşên weha de. Yan jî mirov ku di serê xwe de kari ba li hev bihaniya wan dest bi gotinan dikir. Bi vê yekê re divêt mirov bêje ku dengê Dîlberê jî gelekî xweş bû û mirov hez dengê wê dikir. Dîlberê jî car bi car ji bo ku li gotinên wan hêlbestvanan karker bi hisêne, diçû li nig wan li nav benderan. Diçû nav paleyan de dima ji bo ku li dengê xweş bihisêne. Hezkirin jî dihate ser ziman, di nav wan helbestên ku digotin de. Gelekî xweş, baş û mazin dihanîn ser zimên. Dîlberê gava ku diçû nig paleyan ji bo ku li wan bihisêne, ew jî tevî wan dibû di gotinan de car bi car. Dengê mirov her weha xweşikatiya xwe baş û mazin dihanî ser ziman. Dengê Dîlberê gelekî xweş bû. Mirov ku li

dengê Dîlberê dihesandin bi dengê wê re pir bi hest dibûn. Ku Dîlberê dest bi gotinê dikir mirov ne dixwast ku helbesta ku wê digot bi dawî were ji ber ku gelekî bi hest û ji dil digot. Mirov hez ji Dîlberê dikir. Xweşikatiya wê di devê wê de jî hebû.

Şahiya Newrozê gava ku bi dawî dibû êdî mirov ji jev bela dibûn. Lê wê rojê Dîlberê gelekî xwediyê cûdabûnekê bû di dilê xwe de. Dilê wê gelekî bi kêf û şahî bû. Dilê wê zû bi zû diavêt. Dîlberê piştî şahiya Newrozê re hê behtir bûbû miroveke cûda ji aliyê nêzîkatiya xwe ve. Dilê wê zû bi zû diavet û weke ku xwêhdan pê bikeve lê dihat. Wê roja gava ku dilê wê diavêt gelekî bêhtir hişê dilê xwe hîs dikir ku çawa zû bi zû diavêt. Dîlberê Dilşad ji bîr ne dikir. Dilşad ji hişê wê ne derdiket. Gelekî hizra wê li ser wî bû. Dikir me dikir ew ji hişê wê ne derdiket. Bêguman wê ji ne ne dixwastku ew ji hişê wê derkeve. Ew jî bi wî re gelekî şa bû di hûndûre xwe de. Beharê di dilê wê de dest pê kiri bû. Piştî ku wê Dilşad dîtibû, dilê wê bi şahî bû û şahî di dilê wê de weke avzemeke ku ji xwe re bi herike bû. Newroz di dilê wê de wê roja bûbû weke avzemeke zelal ku diherikî ji xwe re. Dilê wê her weha di wê avzemê de xwe hênik dikir. Hênikayiya dilê wê jî her weha bi Newroza ku bi Dilşad re hevdîtin kiri bû. Lê gava ku şahî di ber êvarê de ber bi dawiyê ve dihat, êdî dilê wê ji bi ber hazneke wê diçû. Dilê wê ne e dixwast ku şahî hew be ji ber ku ne ne dixwast Dilşad ji ber çavên xwe winda bike. Şahiya dilê wê bi şahiya Newrozê re dest pê kiri bû û ne dixwast ku her weha hew bibe. Ku dihizirî dibû wê şahî hew bibe hê behtir hazneke xwe dide dilê wê di wê heyamê de. Ew hazne ku di dilê wê de bû ku xwe dide rûdana wê, weke tirseke ku ês dida. Hê şahî hew ne bûbû. Lê wê ji ber ku hew bibe di dilê xwe de dest bi hizirandina hewbûna şahiyê kiri bû, ji ber ku di dilê xwe de her weha bi Dilşad re dihizirî.

Mitala hewbûne şahiyê û çûna Dilşad jî, her weha ji zû de ketibû di dilê wê de. Ji ber vê yekê jî ni dikari bû bêhtir xwe bide şahîya ku heyî û hê berdewam dikir. Çend xwe dida zorê jî ne dikire ku xwe bide şahiyê di wê heyamê de. Di dilê xwe bi yekcarî ne di nav şahiyê ku dibû de bû. Lê dilê wê bi şahî bû. Gava ku dikenî di kenê wê de dihate têgehîştin ku tiştêk di dilê wê de hebû. Weke ku di dilê xwe de na rehet bû û li ser tiştêkî dikirî dihate xûyakirin. Gava ku dikenî hinarikên wê jî bi dem dibûn û gelekî wê xweşik dikirin. Dîlberê bi vê rewşa ku pê re ye di nav şahiyê de diçû û dihat. Lê ku diçû ku derê ji hinek çavan ku ne debana hawîrdora xwe, ne disekinî di cihê xwe de. Dîlberê keça Axa bû ji ber vê yekê jî çavên mirovan li serê bû. Her weha bi rewşa pê re jî zû bi zû dihate têgehîştin ji aliyê xelkê ve. Gava ku hati bû nav şahiyê jî bi hevalên xwe re gelekî bi rih û can bû. Lê nuha hinekî bêdeng di cihê xwe de disekini. Ji axatiyea xwe ve û her weha wê kêlîkê bi bedengiya xwe re bala mirov dikişande ser wê di nav şahiyê de. Mirov di dilê xwe de dipirsîn ku ka ma çima gelo her weha bêdeng e? Gava ku di serî de hati bû nav şahiyê çend bi deng bû. Lê nuha çend bêdeng maye di cihê xwe de. Dîlberê bi mirov re dilxweş bû. Mirov hez jê dikirin. Ji ber vê yekê jî bala wan li ser wê bû. Bêdengiya wê jî bala mirov dikişande ser wê. Bi vî awayî ta ku di şahiyê de gihana ber dawîya şahiyê ku mirov dest bi belavbûnê dibin jî bêdengiya wê hebûna xwe berdewam kiri bû. Mirov li rûdena wê dimeyizandin fahm dikirin ku di dilê xwe de tiştêk heye di wê kêlîkê de. Lê belê ni zanibûn ji ku ji ber çî her weha di dilê xwe de bê şahî ye. Mirov ku bi lêbat û gav dest bi şahiyê kir êdî her weha berdewama pê re bi lêbat û bi gaviyê berdewam ne kir têt têgehîştin ku tiştêk di dilê wê

de heye. Bala mirov ku li dûrên xwe ne, dikişêne ser xwe ve. Dîlberê jî bi vî awayî bala mirov dikişande ser xwe.

Bêguman divêt mirov vê yekê ji aliyê kesayetiya Dîlberê ve jî şirove bike ji ber ku ya ku herî mazin dihat qada jiyanê, kesayetiya wê bû. Di nav şahiyê de her weha bêdeng mayin jî bêguman wê jî didît ku bala mirov dikişêne ser wê di wê heyamê de. Lê ya di dilê wê de ew di wê heyamê de bêdeng dihişt. Wê ya di dilê xwe de jî têne di dilê xwe de hîs dikir. Ma gelo hinekên din jî ya di dilê wê fahm dikirin? Gava ku li dûrên xwe dimeyizand û çavên xwe digrandin bi derûniyekê re, ku her weha ji xwe dipirse, li dûrên xwe dimeyizand. Weke ku tiştêkî ku bi dizikê kiri be û li dûrên xwe meyizêne ka ma hinekan ew fahm kirine yan ji fahm ne kirine, wilo dimeyizand. Bi vî awayî gava ku mirov li ruyê wê dimeyizand mirov gelek tişt ji ruyê wê fahm dikir. Lê car bi car jî mirov gava ku hizir û ramana wan çû ser tiştêkî ji wan wê ve jî çi kesek ji wan pê ve di wê dunyê de na jî. Her weha li Dîlberê jî dihat. Dîlberê wê kêlîkê xûh dida, germ dibû, di serê xwe de kûr û kûr diçû û her weha car bi car jî bi tirseke ku bi fihêt bû dihate xûyakirin. Lê bêguman dilê wê gelekî wê kêlîkê zû û zû diavêt bi ve rewşê re. Bi vî awayî gava ku şahî giha ber bi dawiyê jî, ew jî xwe bi hink lêzê gihande malê bi hinek hevalên xwe re. Hinek hevalên wê jî pê re bûn ta ku ew hate malê. Lê gava ku hate malê jî di rê de ne dipeyivî. Çi peyv ji nav lêvên wê ne derdiketin û ne jî ji nav lêvên hevalên wê yên ku pê re diçûn di wê heyamê de. Her weha bêdengî weke qanûneke serekê desthilatdar, xwe di nav wan de dihesand. Lê di dilê wan de her weha bêdengî serwer bû. Bêguman mirov ni dikari bû ku ji bo Dîlberê bêje ku di dilê xwe de wilo bû. Dîlberê di dilê xwe de gelekî weke ku bi hest bû dihate xûyakirin. Bi vê yekê re gelek caran

Dîlberê gava ku carinan li hevalên xwe dimeyizand jî, bêhtir çavên xwe li wan ne digirt. Mirov gava ku di dilê xwe de bi hest be, her weha ew çaw bi çaw were li hevberê yekî bisekine ku bimeyizêne ji ber ku kesayetiya hestiyar xwe dide diyarkirin. Di vê diyarkirine de jî gava ku hest serwêr bûn hinekî zor dibe meyizandin û her weha hanîna ser zimên zor dibe. Dîlberê jî mirov dikare bêje ku xwediyê kesayetiyeke ku gelekî bi hestiyar bû. Dilê wê kelegerm bû. Dilê wê zû bi zû tijî dibû. Gava ku li hawîrdora xwe jî dimeyizand bi hestiyarî dimeyizand. Li gor dilê xwe gavavatin weke taybetmendiyeke hestiyariya kesane ya wê bû. Gava ku mirov li çavên wê dimeyizand, bêguman mirov digot qey bi hestir in dihatine xûyakirin. Li çavên wê gava ku dihate meyizandin weke ku rohnîyeke tirêja xwe dabayê, dihate xuyakirin. Vê yekê jî li ser mirov ku pê re ne û lê dimeyizandin, tesîrekê diberde. Ev tesîr ji tesîreke xwezayî bû. Gava ku mirov li çavên wê dimeyizand mirov digot hema wilo li çavên wê meyizêne li mirov dihat. Ev yekê jî ji tesîrên ku ji çavan dihatine ser mirov bû. Dîlberê her weha bi çavên xwe re mirov dikare bêje ku xwediyê xweşikatiyeke xwezayî bû. Çavan wê gelekî xweşik bûn. Lê carina ku kil jî li çavên xwe dida, çavên wê hê behtir bi balkêş dibûn. Bi kil re çavên wê bi mijgulan re xwe bêhtir dide kifşkirin. Lê bêhtir jî ne dihişt ku bi kil re were kifşkirin. Her weha ku wê kil li çavên xwe dida bi awayekî ku ne dihişt ku kil li ser çavên wê re were xûyakirin, bi awayekî xwezayî distand. Wan çavên wê yên ku ne bêhtir biçûk in û ne bêhtir jî mazin in, bi awayekî xwezayî re ew bi çavên kil dide nîşandan. Pora wê gelekî dirêj bû. Pora xwe li ser piştta xwe dikire weke kursakê pahn û diberda. Ew kursa pahn jî girê dida bi hinek bendê ku bi rengên gelekî xweşik dihatine xûyakirinê. Lê bendê ku pê pora xwe girê dida jî ji xiftanên wê jî bêhtir ne cuda dihate

xuyakirin. Xiftanê xwe jî bi milikan re dikire du qat li ser çengê xwe re. Qatek diavête ser pişta xwe re û bi ev re girê dida û qata dî jî digihande gûzeka destê xwe re û li ser gûzekê bi bendekî re girê dida. Gava ku bi bend girê dida jî li ser destê wê re ji destê wê dibû weke gûleke ku destên wê di nêvî de be. Destê Dîlberê jî weke ku tiliyên wê dirêj bûn dihatine xuyakirin. Destê Dîlberê xwediyê sipîtiyekê xûngir bû. Her weha destên wê dibûn weke ku di nav ava mûmê de kiri be, dihate xuyakirin. Gava ku bi xiftan re bû weke ku desmalkekê jî dikire destên xwe de. Ew desmalka jî piraniya di destê hemû keçikan de dihate xuyakirin ji ber ku weke semboleke keçkaniyê dihate nîşandan. Desmalka destê weke nişana keçkaniyê dihate zanîn. Keçên ku bi dergîsî dibûn yan jî her weha hez j'yekî kiribin, bi piranî desmalê xwe di destê xwe de diberda destê wî de. Ev yekê jî dihate wê wateyê ku dilê min ya te ye û ez gelekî hez j'te dikim. Bi vê nêzîkatiyê re Dîlberê desmalê destê xwe berda bû di destê Dilşad'ê de.

Dîlberê piştî ku şahî hew bûbû êdî hati bû malê û di odayê de rûniştibû û dihizirî ji xwe re. Her weha ew çî hizir bûn ku di serê wê de hebûn ku ew di nav xwe de wisan kûr û dûr çû bû. Gelekî dihizirî û dihizirî. Lê belê wê kêlîkê tenê dihizirî. Ji wê pê ve tiştêk ne dikir. Dîlberê yeka bi fahm bû. Gava ku li rewşa mirov dimeyizand jî fahm dikir ku derdekî mirov heye yan nîn e. Bi vê yekê re jî li hevberê pirsgirêkên wan yên ku didîtin an jî hatibana hevberê wê, ne bêpirsiyar bû. Her weha mirov dikare bêje ku yeka bi berpirsiyar bû. Ji ber vê yekê jî neqebine wê û mirovan hebû. Ji ber ku gava ku pirsgirêkeke wan hebûya, diçû nig wan û ku ji destên wê dihat ji wan re dibû alikar. Ji ber vê yekê jî navbera wê û mirovan hebû û germ bû. Bi vî awayî re mirov dikare bêje, bi hemû mirovan re

têkilîyên wê he bûn û germ bûn. Miroveke bi ruh û can bû. Ji ber vê yekê jî ji bi mirov re germ dihate xuyakirin. Miroveke ku picêki ji guharandin pê re hatiba çêkirin, dihate xuyakirin ji aliyê mirovên li dûrên wê ve. Ji ber ku ew bi agehdar bû li hevberê mirov û pîrgireken wan ku hene. Bi vî awayî jî baleke xwezayî ji aliyê mirovan ve dikete ser wê de. Her weha bala mirov jî li ser wê hebû. Mirov ku bi pîrsgirêka hevdû re mijûl dibûn, êdî bi dilêkî xweş di dilê hevdû de cih digirtin. Bi vî awayî re jî, hinekî navê wê jî derketi bû. Carinan ku mirov pîrsgirêkên wan çê dibûn û bi tenê maban û diçû nav mirovan û digot bi pîrsgirêka xwe re bi têne û rû bi rû mabû. Mirov jî digotiyê de Dîlberê zanibana te bi têne ne dihêşt. Bi vî awayî mirov li ser wê hinek gotinên kevn yên xelkê jî digotin. Her weha gotineke kevn û gelekî bi nav û deng hebû, ku ji bo wê mirov dihanî ser zimên. Mirov ev gotin her weha digotin ji bo bi wê gotinê re 'şêr şêr e, çî jin e çî mêr e' digotin. Rast bû 'şêr şêr e, çî jin e çî mêr e'. Gava ku mirov xwast tiştêkî bike, zanebûn û xirabbûn diviya bû hatiba ber çav. Gava ku xirab nebûne wî çaxî mirov dikare bêje ku bi serkeftinê re jî hinekî zor dibû. Bi gotina xitatê re mirov bi du awayan hizir dihanî ser zimên di nav civakê de. Her weha, ya pêşî ji aliyê kirinê ve dihate ser zimên. Di vî aliyê de bi bêhtirî ji aliyê hizir û hestewariyê ve dihate ser zimên. Nêzîkatiyeke bi rûmet jî bi vê yekê re dihate şirovekirin. Ji aliyê karguzariyê ve jî weke ku mirov di kar û barên xwe de wê hêzê di xwe de bibîne û kar û barên xwe bike, ji vê yekê dihate ser zimên. Ji vi aliyê vê jî mirov li jiyana hevdu dimeyizandin ku ka ma çend zîrektî heye. Ev nêzîktî jî her weha weke xiyreteke dihate şirovekirin. Ewan nêzîkatiyan, nêzîkatiyên civakê û yên civakî bûn. Her weha mirov dikare bêje ku wateyeke wan nêzîkatiyan jî weke kevneşopiyê bû. Ji xeynî vê yekê jî mirov di



nav civakê de wateya wan bêjeyên di hevdu de jî lê digeriyan. Ev yek ji aliyê kesayetiye ve jî weke taybetmendiyeke dihate ser zimên. Bi vê yekê re mirov di jiyana xwe de hinekî taybetmendiye ku xwe pê di jiyane de bidin naskirin dabûn çêkirin. Weke taybetmendiyeke mazin û ku lê agehdar bin nêzîk dibûn. Di jiyana civakê de alîkariya hevdu kirin û bi hev re bi dilbûn mayin jî weke nêzîkatiyên girîng bûn, ku xwe didane nîşandan. Mirov her weha li çavên hevdu dimeyîzand ka ma dilbûneke çawa heye yan jî nîn e. Bi vê yekê re nêzîkatiyeke ji dil li hevdu dihate kirin. Dîlberê jî di nav mirov de ji aliyê wan taybetmendiyan ve pir baş û mazin dihate dîtin û şirovekirin. Carina ku mirov lê dimeyîzand û digotin ku bi mirov re başbûn ne têne bi temen re ye di mêjî de ye. Têne mirov gava ku ji aliyê temen ve hinekî mazin dibe, hê bêhtir dibîne û nas dike. Bi vê yekê re jî jê taybetmendiye weha têne xwastin. Gava ku ji aliyê taybetmendiye weha ve ne temam bûna jî kêr dihate dîtin. Li ser vê nêzîkatiye re ji rexne ji lê dihatine kirin ji ber ku di nêzîkatiyên xwe de kêr in. Gava mirov digihana temenekî mazin û navser dibûn, êdî ji wir pê de kêmasî ji wan ne dihatine pêjirandin ji aliyê mirov ve di nav civakê de. Divêbû bi temenê xwe re çend mazinbûna, evçend jî di nêzîkatiyên xwe mazin bûna. Her weha ev yek jî weke felsefeyeke civakî ya nêzîkatiye xwe dida nîşandan. Lê gava ku jî kêmasîyeke mazinan bihatina dîtin jî, mînak nêzîkatiya zarokekî didanê de. Her weha jê re dihate gotin ku 'wê xirabiyê kir lê li wê zarokê ha yê biçûk meyizêne û ji xwe re fêr bigire, bila ew bibe mamosteyê te lê meyizêne.' Bila ew bibe mamosteyê tev gotin ji aliyê nêzîkatiye ve ku ne baş hatibana pêjirandin bi vê mînakê re ji bo ku kêmasiya xwe bibîne, dihate gotin. An jî her weha bi vê yekê re girêdayî dihate gotin ku ev xeletiya ku bi mazinatiyê re hate kirin

ji bo ku careke din neyê kirin. Bila li zarokekî biçûk were meyizandine êdî careke din ew xeletî neyê kirin. Wateya vê gotinê jî ji aliyê hizirandinê ve dihate ser zimên. Ango hişê biçûk bi zanebûnê dikeve xeletiyên de.

Dîlberê ji aliyê nêzîkatiyên xwe ve jî ji aliyê gelek mirovan ve weke nimûne dihate nîşandan. Ji aliyê gelek nêzîkatiyên xwe ve, li ser zimanan bû. Hê ciwan bû lê gelekî jîr bû. Ji aliyê xwandinê ve jî li nig saydayên ku bi zane bûn fêrên xwe hilda bûn. Xwediyê perwerdeyê baş û mazin bû. Di nêzîkatiyên xwe de civakî bû. Li ser hizra civakê ve diçû. Her weha mirov dikare bêje ku nêzîkatiyên wê ew dikişande nav mirovan di aliyê xwe de. Li hevberê pîrgirêkan civakî ne bi bêberpirsiyar bû. Wê xwe bê xem ne dikir. Miroveke li hevberê pîrsgirêkan bi xem bû. Pîrsgirêkan ku yên li hevberê wê ne, wê weke pîrsgirêkan xwe didîtin. Bi vî awayî xwe dida nîşandan. Mirov bi berpirsiyariya mirovan bi qadr û qiymet bûn. Ji ber vê yekê jî mirov gelekî hez ji Dîlberê dikirin. Dîlberê ji vî aliyê ve di nav mirovan de keçeke delal bû. Mirov her weha lê dimeyizandin. Keça delal xwediyê hinek taybetmendiyan hestiyar û berpirsiyar e. Ji aliyê kesayetiyan ve jî hestiyar e. Bi têgehîştin û jiyana xwe re jî bi zanebûn û tenik e. Dîlberê di nav mirovan de her weha dihate naskirin. Ji aliyê nêzîkatî û zanebûna xwe ve jî her weha bi wate bû. Dîlberê her weha miroveke wilo bû ku nêzîkatiyên vala ne didane nîşandan. Nêzîkatiyên wê xwediyê wateyê mazin bûn. Bi axiftin û gotinên xwe re mazin bû. Her weha bi nêzîkatiyê jî mazin bû. Zanibû wate hizir çî ye yan jîne çî ye. Serê wê bi mejî bû. Gava ku dipeyivî fahm dikir ku diviya bû li gotina xwe baş bihizire û pişt re bêje. Di vêgotinên xwe de xwediyê gotin û nêzîkatiyên jîr bû. Nêzîkatiyên mirov di ser wê de gelek hebûn. Bêguman jî diviya bû

wilo bihêne ji ber ku gelekî bi pirsgirêkên mirov ve mijûl dibû. Ji nêzîkatiyan an jî her weha ji tevgerên mirov di nav axiftina xwe de mînakdayin wê çêtir nav mirov de dide têgehîştin. Gava ku mirov ew fahm dikir jî, hê bêhtir ew dikete dilê wan de. Gelek mirov bi jê re digotin Delalê Dîlberê. Delalê Dîlberê bêjeyeke ku nêzîkatiyeke bi hest û bi hezkirinê dihate ser zimên. Ev gotin ji dilê mirov dihat û jê re dihate gotin. Ji aliyekî ve ji hezkirine mirov ve bêje dihanî ser ziman. Lê ji aliyekî ve ji jî aliyê hestên ve mirov xwe û ew bi hev re û nêzîki hevdu dîtin ji ber ve yekê ji tenin ser ziman. Bêguman her weha ji aliyê qencyê ve gelekî di dilê mirov de bû. Vê yekê jî ji aliyê nêzîkatiyeke xweza ve di navbera wê û mirovan de bingehekî mazin dabû avadikirin. Bi wan aliyên xwe re hemû aliyên wê dihate naskirin û têgehîştin. Lê divêt di vir de mirov bêje ku piştî şahiyê sakinandina ku pê re çêbû ji aliyê xelkê ve pir baş û mazin dihate xuyakirin. Mmîrov ku lê dimeyizandin beri hingi çend bi kef û şahî bû û wê kêlîkê ji her weha wilo bêdeng bû di cihê xwe de mabû. Lê ew şahî û kêfên wê kêlîkê pê re ne didîtin. Tenê gava ku jê dihate pirsîn ku ma çî wê heye, hinarikên wê dem digirtin û sor dibûn. Gava ku jê dihate pirsîn jî çî bersiveke wilo mazin ne dida. Vê yekê jî bala mirovan dikişand ser wê ji ber ku Dîlberê ne yeka ku pirsên ku jê dihatine pirsîn bêbersiv bihişt. Di wê kêlîkê de gava ku jê hatiba pirsîn bersiv dida. Lê wekî din jî bêdeng dima di cihê xwe de. Piştî şahiya Newrozê li nig Dîlberê guherandinek çêbû bû. Ev yek jî gelekî bi bal dihate xuyakirin û li ber çavan bû. Mirov ku lê dimeyizandin dixwastin fêhm bikin ku ka ma çî pê re heye ku weha diket hizirandinan de. Dîlberê gelekî di dilê xwe de bû wê kêlîkê. Gava ku li ruyê wê dihate meyizandin, dihate dîtin ku tiştêk di dilê wê de hebû ku ew tiştê ku di dilê wê de bû hem wê şa dikir û hem jî dilê

wê diguvişand. Piştî şahiyê gelekî dikete huznan de. Li ber Dilşad jî diket. Gava ku di serê xwe de li ser wî dihizirî kûr diçû. Lê bi hizirandina Dilşad re di dilê wê de şahiyek jî çê dibû. Ev yek jî pir baş û mazin dihate dîtî û têgehîştin ji aliyê mirovan ve. Mirov ku zaniba ew li ser Dilşad dihizire, wê hinekî fahm kiri bana ku ji ber çî ye û çima ev çend dihizirî. Lê gelekên wê yekê ni zani bûn. Têne gava ku bi Dilşad re rû bi rû dibû, sê çar keçên hevalên wê bûn û di wê heyamê de pê re bûn û li nig wî bûn û hwd jî pê deçî kesekî tiştêk ni zanî bû derheqê di dilê wê de. Keçên hevalên wê jî gava ku lê dimeyizandin hinekî weke ku di nav xwe de dibêşisînin ji lê dimeyizandin û ew jî tevî bêdengiya wê dibûn.

Dîlberê gelekî di rewşeke cûda de bû wê kêlîkê. Lê gava ku lê dihate meyizandin jî dihate têgehîştin ku bi kef û dilxweşî bû. Her weha bi vê rewşê Dîlberê re gava ku mirov li Dilşad jî dimeyizand mirov didît, ku ew jî gelek weke awayê Dîlberê de bû, dihate xuyakirin. Dilê wî jî pir bi kêf û bi xweşî bû. Gava ku Lê dihate meyizandin ev yekê pir baş û qenc dihate têgehîştin û dîtî. Di şahiyê Newrozê de Dilşad gelekî bi kêf bû. Ew bi xwe re û bi hevalên xwe re jî hinekî dûr hati bû lê ev yek ji bo wî ne li ser gotinê jî bû. Ji ber ku ew têne li şahiyê dihizirî. Ji aliyekî din ve jî Dilşad mirovekî ciwan bû û gelekî jî kelegerm bû. Ev yek jî gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtî. Mirov weke ku hez ji Dîlberê dikirin, her weha hez ji wî jî dikirin di herêmê de. Dilşad jî bi jêhatîbûn û zîrekiya xwe ve di dilê mirovan de cih girti bû. Mirov ji aliyê kesayetî û qenciya wî ve li civatan ew weke mînakeke didane nîşandan di nav gotina de. Bi rastî jî Dilşad mirovekî gelekî zîrek û jêhatî bû. Di nav şahiya Newrozê de ev aliyên wî pir baş û qenc li ber çavên mirov bûn. Ji ber vê yekê bû ku gava ku çawa hati bû nav

şahiyê, mirovên mazin û serwer jê re xeber şandi bûn ku were li nav wan rûnihê. Dilşad her weha bi kesayetiya xwe re li ber çavan bû. Bi kirinên xwe re jî xwe kiri bû çavên mirovan ku li dûrên wî bûn. Dilşad gava ku hati bû nav şahiyê jî bala mirovên ku li şahiyê bûn di cih de kişandi bû li ser xwe de. Her weha her mirov ku ew kifş kiri bû Dîlberê jî ew kifş kiri bû di nav şahiyê de. Dîlberê gava ku ew dîtibû bala xwe da bû ser wî di nav şahiyê de. Dilşad mirovekî ku bi nêzîkatî bal dikişand ser xwe. Lê gava ku Dilşad bi Dîlberê re rû bi rû hati bû, êdî Dîlber j' hizrên wî ne derdiket. Di nav mirovên mazin de gava ku rûnişti bû jî car bi car ji xwe ve diçû. Bala wî ji xwe ve diçû ser Dîlberê di wê heyamê de. Dilşad mirovekî di nav mirovan de zanibû ku çawa bipeyivebe û tevbigere. Gava ku dipeyivî jî mirov lê pir baş û mazin dihesand. Di nav civatekê de her weha axiftin hinekî mazinbûn diviya bû ji ber ku bi axiftinê re xwe di nav civatê de dide guhdarkirin. Her weha ji aliyê taybetmendiyan ve jî be û ji aliyê kesayetiye ve jî be jêhatî û mazin bû. Li gor wan mirovên ku di nav civatê de rûnişti bûn ew ne mirovên ku bêhtir mazin bû. Lê dîsan her weha weke mazinekî li nav wan dirûnişt û xwe ji aliyê wan ve dide hesandin. Ev yek ji tişteki gelekî girîng bû û diviya bû mirovên mazin û girîng şirove bike. Mirov di nav civatan de bi zanebûn û mazinatiya xwe ve xwe dida herêkirin û hesandin. Her weha divêt mirov bêjê ku bi zanebûnê re jî gavên xwe avêtin jî gelekî girîng bû. Dilşad bi wan aliyên xwe ve jî hinekî li ber çavan bû di nav wan de. Dilşad ji aliyê zanebûnê ve jî ne mirovekî ku nezan bû. Mirovekî xwende bû. Li nig seydayên dest bi xwandina xwe kiri bû. Her weha gava ku biçûk bû, jî bi fahmbûnê ve ketibû çavên mirovan de. Mirov lê dimeyizand ku zû fahm dikir û pêde diçû êdî bala xwe didanê de. Lê bêguman Dilşad mirovekî bi gelek derfetan mazin bûbû. Malbata

wî malbateke ku ji aliyê taybetmendiyên xwe ve serwer bû. Wan taybetmendiyên bi Dilşad re jî bi du aliyan re jê re bûbû bingeh di pêşketinên wî de. Aliyekî ve bi serxwebûna wî re jê re bûbû temen û kesayetiya wî ava kiri bû. Ji aliyê din ve jî di nav mirovan de ku ji bo wî ji aliyê rêzê ve dihate ber çavan weke bingehê teybet. Di pêşketin û mazinbûna wî de û rêzdayina wî de bêguman gava ku mirov şirove bike divêt mirov wan taybetmendiyên jî bir neke.

Mirovê ku ji nav malbateke serwer were, wê xwediyê hinek taybetmendiyên ku di malbata wî de hene jî pê re be. Lê ew bi xwe re bi kesayetiya xwe re di demê de bi dîtinên xwe re xwe dide rûniştandin. Lê gava ku ji aliyê kesayetiya ve xwe ne jêhatî daba nîşandan jî, wê çaxê mirov ne dikarî bêjê ku wê di nav mirovan de mazin bihata dîtin. Di demên kevin ve mirovên ku ne dixwastin xwe bidin ber çavan, diçûn tiştekî mazin dikirin. An jî wê çûbana nêçîrê, nêçîreke baş kiri bana ku mirov jî li ser wan bipeyiviyana. Ev taybetmendiyên di demê de hinekî bi fahm bû û xwe di gelek tiştan de dida ber çavan. Her weha bi tiştekî baş re hatina ber çavan û navê wî bi tiştekî baş re hati be hildan jî gelekî girîng bû. Ew taybetmendiyan jî ji wê demê ve ta ku giha dema Dilşad weke, darekî ku bi çiqilên xwe re xwe bêhtir bike her weha xwe gelekî bêhtir û kûr kiri bû di jiyana civakê de. Di wê demê de jî her weha ji aliyê hûnerên dest û mejî ve be jî gelekî aliyên xwe ve di ceribandîn û dayin li ber çavan jî çê dibû. Xwastin hildana nav bi mejî re pêş dikeve. Her weha taybetmendiyên kesayetiyan yên ku li jiyana bi wate ne bi zanebûnê re xwe didane ber çavan û dihanîne ser zimên. Dilşad di nav wan gotin û taybetmendiyên xwe de hinekî bi taybetmendiyên kesayetiya yên ku kûr û bi zane ne dihate ber çavan de. Her weha divêt bi Dilşad re hinekî taybetmendiyên ku di

demê de weke rade dihate dîtîn jî, mirov bihêne ser zimên. Ewan taybetmendiyan bûn ku ew dikire ber çavan. Bi vê yekê re bûyina suwarekî baş û jêhatî jî, bi wê taybetmendiye re hatine naskirin, ev taybetmendiyeke girîng bû. Bi vê yekê re jî taybetmendiyan nêçîrvanekî baş û şivanekî qenc jî dihate lêgerîn di mirovên ku weke Dilşad de. Nêçîrvanekî qenc bazên xwe baş dida gerandin û di şevînan de xwe baş bi cih dikir. Nêçîrvanî jî her weha weke şivantiyê jêhatiniyê û zîrekiye dixwaze ji mirov. Nêçîrvanekî baş ji mirovekî gelekî zîrek pêk tê. Ji wan aliyan ve jî hinekî Dilşad bi nav û deng bû. Ew ne dima li ber sewalên bêhtir. Lê her weha kirinên wî hebûn û kirinên wî dihatin zanîn di nav mirovan de. Di nav şahiyê de ji aliyê mazinan ve hati bû dewêtkirin ji bo ku here û di nav wan de rûnê. Di wê heyamê de jêhatîbûna wî û mazinbûna malbata wî her weha di serê mirovan de bû. Çend cihêkî hinekî dûr ve jî hatibe, dîsa divêt mirov bihêne ser zimên ku li wir jî dihate naskirin û gelek caran jî bi hevalên xwe re hati bû wê cihê. Ew der cihê mala apê wî bû. Mala apê wî li wir sereke bû di nav civakê de. Ew jî ji mala apê her weha dihate naskirin. Bi rastî jî her weha jî bû. Mirov ku ew bi xwe ji mala axa û bega bû. Hinekî ji wî aliyê jî mazinbûna wî hebû. Lê bêhtir mirov li kesayetiya wî dimeyizandin û ew şirove dikirin. Kirinên baş mirov mazin dikin. Ew jî her weha xwediyê kirinên çak bû. Her weha ma ku Dilşad jî ne mirovên ku bikaribin bi wî awayî re wilo baş û mazin û qenc hati ba naskirin? Bêguman divêt mirov bêjê ku mirov ku wê bi kerî xwe baş wê wêrin dibin xwediyê naskirin. Tiştê ku ew dide naskirin jî kirinên kesayetiya wan e. Mirov ku di cihên xwe de rûniştibin wê çawa bihatana naskirin û bibûna xwedî rêz di nav mirovan de. Kirinên mirov rastîya wan derdixe ber çavan ji bo ku mirov wan bibînin. Mirov bi kirinên xwe re tînin dîtîn û aliyê

têgehîştin û hizirên xwe ve jî bi vê yekê re dibin xwediye hinek taybetmendiyan mazin. Mirov wan taybetmendiyan jî bi sinc û kevneşopiyên re dide ber çavan. Her weha nêzîkatiyên wêrin ser ziman jî wan taybetmendiyan re ji xwe re bingehê didine çêkirin di jiyane de. Gava ku di nav civate de rûnişti bû ku fahm kiri bana jî ku Dîlberê lê dimeyizand, diviya bû ku gava xwe li gor civate biavêta. Gava ku ew û Dîlberê hati bûn hevberê hevdu û li hevberê hevdu sekinî bûn ji çend Dîlberê di serê wî de cih ji girti bû û wê kêlîkê di aqlê wî de jî bû û xwe dide kifşkirin. Lê gelekê bêdengmayin jî bi wî re ji bo vê yekê bû. Desmala Dîlberê bi wî re bû. Danîbû di bin îşliga xwe de li ser dilê xwe de. Desmala Dîlberê gava ku li ser dilê wî bû weke ku destê Dîlberê li ser dilê wî be lê dihat. Hizra wî jî li ser desmalê bû û bi desmalê re li ser Dîlberê bû. Li hawîrdora wî mirov ku şadibûn û diçûn û dihatin di nav şahiyê de dimeyizand lê hizra wî li ser Dîlberê bû. Mirovên mazin yê ku ew di nav wan de rûnişti bû jî ji xwe re dipeyvîn û pirs ji hevdu dipirsîn û bersiv didanên hevdu di wê kêlîkê de. Diviya bû ku ta wî û hişê wî li ser mirov ku didipeyvîn bihêne di nav civate de. Ji ber ku hatiba têgehîştin ku ta wî ne li ser peyvên ku dihatine kirin û li dereke dî yan jî li ser tişteki din bihêne wê ev yekê weke nêzîkatiyeke birêz hati ba şirovekirin. Ew bi xwe li wir bû lê hişê wî ne li wir bû wê kêlîkê. Hişê wî li ser Dîlberê bû. Di hişê xwe de li ser Dîlberê dihzirî û mûjûl dibû. Dîlberê, piştî ku hati bûn nig hevdu û desmala xwe dabûyê de êdî hizrên wî hemûkan bi wê re bêrawastan bû bû.

Dilşad piştî ku şahî hew bû bû êdî ew jî bi hevalên xwe yê ku pê re hatine, xatirê xwe dixwazin û riya xwe ya malê digirin diçin. Dilşad gava li hespê xwe suwar dibe û hevalên wî jî li hespên xwe suwar dibin û didin rex hevdu de û diçin di rê de. Di wê heyamê de



gava ku li Dilşad dihate meyizandin dihate têgehîştin ku tiştin di serê wî de hebûn. Bi wî re jixweçûbûn li ser hespî çêdibû. Hevalên wî yên ku pê re ne wan jî vî yekê fahm dikirin. Lê wan jî tiştêk ne digot. Bêdengî weke qanûneke sereke hukmê xwe li ser wan dabû avakirin. Hevalên wî jî ne dipeyvîn li ser hespan. Ewan ji her weha tenê li ser hespan bi bêdengî diçûn. Lê Dilşad gelekî ji xwe çûbû. Ji rewşa wî ew yek pir mazin dihat têgehîştin. Dilê wî pir zû diavêt. Lê dilê wî şad bû. Di serê xwe de hizra wî li paş wî ve mabû. Gava ku wê kêlîkê li ser hespê xwe diçû û ji wir dûr diket digot qey tiştêkî xwe li paş xwe ve ji bîr kiriye, wisa lê dihat. Dilê wî di wê heyamê de dualî bû. Aliyekî ew bi paşve dikişand û digotiyê de vegere. Li aliyê din jî ew bêdil dibire malê. Lê gava ku bi wî awayî re mirov li Dilşad dimeyizand, mirov didît ku di hûndûre wî de her weha tiştin ku wî paş ve dikişandin bêhtir di dilê wî de germ û bi tesîr bûn. Lê wî ne dida kifşkirin. An jî ne dixwast wêrin kifşkirin. Weki din jî ne dixwast ku yê ku di dilê wî de were kifşkirin. Gava ku hevalên wî li ruyê wî dimeyizandin, dida xwe ku xwe bi hêz bide nîşandan. Gava ku hevalên wî lê dimeyizandin wî jî bi rûyekî beşişî li wan dimeyizand û ku di serê wî de gotinên xwe digotin ji wan re di wê heyamê de. Lê diviya bû ku mirov bêjê ku Dilşad bi awayekî hati bû ji bo şahiya wê derê, lê bi awayekî din jî di vegera malê de bi hevalên xwe re vegere. Di vegerandina xwe de desmalkek pê re bû û li ser dilê wî bû. Wateyek wê desmalka mazin û girîng hebû ji bo wî. Dilê wî ji ber vê yekê jî pir bi dilpêrîn diavêt.

Dilşad di bin stêrên ezmana de riya xwe digirt û diçû. Li ser wî li ezmana gelek stêrên ku rohiya wan xurt bûn dihatine dîtin bi çavan re. Di wê demê de weke ku azman hê bêhtir nêzîktîri mirov bibe stêrên azmana mazin û bi rohnî dibûn li ber çavan. Heyv jî

dihate xuyakirin. Li ser hespên xwe di nava reşê şevê de diçûn û diçûn bi bêdengiyekê ku li ser wan serwer bû. Dilşad wê kêlîkê gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtîn ku hişê wî ne li wir bû. Bi hişê xwe re ne bi xwe re bû wê kêlîkê. Li ser hespan gava ku diçûn hevalên wî car bi car gotin di avêtin holê da ku deng derkeve û axiftin çêbibe. Lê dîsa bêdengî gran bû. Weke carina mirov ku dixwast hinekî bêdengiyê çêke û ji bêdengiyê weke demêke kin jî hew bibe vê carê jî ji bêdengiyê derketin û xwastin deng derkeve û bi axiftinê re kurne dikirin. Bêdengî dîsa li ser serê wan serwer bû. Hevalên wî pir dixwastin ku jî wê bêdengiyê derkevin lê kurne dikirin ni dikari bûn xwe derxin. Wê kêlîkê wan çî kiri ba jî ne dibû alîkar ji wan re ku ji bo ji bêdengiyê derkevin. Têne dengê lingê hespên wan dihat. Gava ku lingê hespên wan li keviran diket deng derdixist. Wan jî ewan dangan hez dikir. Ji wî dengê pê de ve çî dengên din ji wan ne dihat. Li ser hespên xwe gava ku diçûn weke ku reşikên li ber çavên wan bikevin li wan dihat. Her weha wilo li ber çavên wan dihat. Gelek caran jî weke ku tivlinkê bibînin li wan dihat. Lê şev bû û bêhtir jî mirov ni dikari bû ku kifş bike bi çavên rût re. Tivlinkên şevê piştî ku reş dikete erdê de digeriyan. Bi rojan jî di cihên xwe de diman. Her weha kund jî bi şevê car bi car derdiket. Kund bi rojê re jî derdiket. Çavên kundî di reşayiyê de dibin weke çirayekê û dibiriqin. Gava ku di re de diherin her weha li cihna rastî kundan jî hati bûn. Di wan kêliyan de hevalên wî ji bo ku bêdengiyê xirabkin gava ku teyrikek didîtîn navê teyrikekî din digotin daku bi Dilşad re jî bikevine di nav peyivtinê de û bêdengî xira bibe. Carekê her weha gava ku digihêjin dehma kundekî, hevlekî wî li wan dizivire û dibêje 'ma gelo nuha yê ku em di ber re çûn, kund bû yan ji pepûk?' Yeki ji wan gut 'ma di vê reşê şevê de

wê papûk çawa derkeve?’ Pişt re yekî din ji wan tevî gotinê bû û behsa xwandina papûkê kir. Li ser vê yekê her weha du hevalên Dilşad di nav xwe de dest bi peyivtinê kirin. Yeki gut ‘ma gelo pepûk gava ku dixwêne dibêjê çi? Yê din ji got ‘dibêje pepû kê kuşt min kuşt’. Hevalê Dilşad yê ku pirsî, careke din jî her weha pirsî ‘ma gelo ji ber çi dibêje ‘min kuşt?’. Careke din hevalê wan yê ku dipeyivî bersiv dayê de û her weha berdewam kir di gotinê de. ‘Dibêjin ku rojêkê keçikê û birayê wê hebûn. Keçik gelekî hez ji birayê xwe dikir. Lê rojêkê li ser karekî guftûgoyek di navbera wan de çêdibe. Kecik jî destê xwe li singê birayê xwe dixê û birayê wê bi paş ve gava xwe davêje ku lingê wî li kevirekî ku li paş wî ye dikeve û ew ber bi paş ve li erdê dikeve. Lê gava ku dikeve erdê, êdî birayê keçikê na rabe ser xwe ve. Di wê heyamê de lawik dimire. Keçik jî dilê wê gelekî diêşe û bi wê dilêşa xwe re di efûya xwe ji Xudayê xwe dixwaze ku wê bike ajelek ku di nav mirovan de be. Tê gotin ku Xuda jî dua wê erê dike û ew dike pepûk. Pepûkiya wê ya li ser birayê wê jî dibe navê wê ye teyrikatiyê ku. Pepûkatiya wê her weha ji papûkatiya wê tê’. Hevalên wan ê sêyemîn ji tevî axiftinê dibe û ew jî her weha dibêje ‘herê rast e, Lê ji xeynê vê gotinê bêhtir û cudatir jî hene û tene gotin di nav xelkê de’. Hevalê ku peyivî lê zivirî û got ‘herê rast e, min tenê yek ji wan vebêjînan got’. Pepûk bi dilêşiyê re heye. Mirov ku ew vebêjînan dihanîne ser zimên, gelekî pê bi dilêş dibûn. Gelek mirov jî digotin ku mirov dilêşiya pepûkê fahm bike, mirov wê wî çaxî jî dilêşiyên ku wê fahm bike. Mirov ku dilên wan gelekî bi êş bin digotin ku ‘weke pepûkê’ye. Şibandina pepûkê ji di nav xelkê de çêdibû. Şibandin ji aliyê dilêşiyê ve dihate ser ziman.

Dilşad jî vê vegotinê dizanî bû. Lê her çend hevalên wî guftûgo kirin jî, ew tevî guftûgoyên wan ne dibû ji ber ku hizra wî ne li wir bû. Dîlber di serê wî de bû. Hizir û ramanên wî li ser Dîlberê bû. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêjê ku dibû ku axiftina ku li nig hevalên wî dibû hez jî ne dikir ji xweçûna xwe ve. Hizra wî ne li wir bû. Lê hevalên wî jî gelek caran gava ku dipeyvîn û gotinên xwe digotin jî di daviya gotinên xwe de bêjeyên pirsê wekev 'ma na' yan ji 'ma ne wilo ye' bi ser ve dikirin û digotine Dilşadî. Dilşad jî çî gotin hatiba gotin baş guh ner li ser bû. Gava ku li Dilşad dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku hizra wî ji gotinên ku dihatina kirin dût bû. Ji ber vê yekê jî dana bersivê jî dijwar bû. Ji vê yekê wirdetir jî hizra wî dût û kût bû. Ew bi Dîlberê re ma bû. Yekê ku hizra wî ne li wir ba, wê çawa bersiva pirsan bida. Yan jî wê çawa tevî gotinên ku têne kirin bi ba. Bêguman di wê kêlîkê de gava ku li rewşa Dilşad dihate meyizandin dihate têgehîştin ku bi hizir û ramana xwe re li dûriyê bû. Di serê xwe de li cihêkî dibû yan jî li ser tiştên din dihizirî bi Dîlberê re. Her weha gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bi hebûna xwe re, bi hevalên xwe re bû lê bi hez û hizra xwe ve ne li wir bû. Hevalên wî jî gava ku lê dimeyizandin, ev yek pir baş û mazin fahm dikirin. Hevalên hevdu yên kevin bûn. Hevalên hevdu yên zarokatiyê bûn. Ji ber vê yekê jî hevdu baş nas dikirin. Çî kar û barên wan heba bi hev re dikirin. Ji hevdu qut ne dibûn. Hezkirina wan bi hevdu re gelekî mazin bû. Weki din jî her weha ciwan bûn. Ciwanbûn û hevaltî di laşekî de ku digehê hevdu, dibe weke hêzeke serwer ji bo kesayetiyan. Ciwan wî çaxî hinekî din bi xwe re bi bawer mazin dibin û pêş dikevin di jiyana xwe de. Rihê hevaltîyê ji vi aliyê ve her dem jî xwe ciwan dihêle. Lê di deman de bi zanebûn dibe. Ev zanebûn jî dibe bingeha gelek pêşketinên

kesane û yê psîkolojîkî û civakî di kesayetiyan de. Bi ciwanan re hevaltî weke taybetmendiyeke çandî ji di jiyane de xwe dide ber çavan. Her weha di vir de divêt mirov bêjê ku di bingeha hevaltiyê ji hev bawerkin, naskirin, nêzîkatî û li hev hesandin jî weke taybetmendiyeke girîng in tene ber çavan. Hevaltiya wan jî her weha xwediyê bingehekî mazin bû. Ji aliyekî din ve jî her car jî li cihêki bûn û bi hev re mazin bû bûn û her kar û barên xwe jî bi hev re kiri bûn. Bi vê yekê re mirov dikare bêjê ku ji hev re weke bira bûn. Hevaltiyeke wan hevaltiyeke baş û bingeha wê weke biratiyekê bû ku di nav malê de bû. Dibit ku gelek caran jî ji biretiya di nav malê de jî bi rastî û hizir û nêzîkatiyên xwe re bibuhure. Çand û hunera hevaltiyê di rastiyê de ji aliyê hizir û civaknasiyê ve nêzîkatiyên xwe ava dike. Lê gava ku dihêne ser ziman jî, di bingeha xwe de bi wate dike. Dilşad her weha mirov dikare bêjê ku xwediyê hevaltiyeke mazin bû. Lê nuha wê kêlîkê hestên dil li ser wî serwer bûn. Hestên hevaltiyê û yê evîndariyê xwediyê taybetmendiyeke xwe ne. Dilşad vê yekê zani bû. Gelekî jî hez ji hevalên xwe dikir. Hevalên wî jî gelekî hez ji wî dikirin. Lê ew wê kêlîkê li ser vê yekê ne di hizirî. Ew li ser dilê xwe dihizirî û dirawestiya. Dîlberê di dilê wî de bû. Wê kêlîkê weke ku di xew ve herê ji xwe ve diçû gava ku li ser Dîlberê dihizirî. Dilê wî ew cara pêşî bû ku her weha zû bi zû diavêt û dilperiyeke mazin di hundurê xwe de dida nîşandan. Di dilê xwe de wê kêlîkê ji Dîlberê weke ku ne dûr bû. Wilo lê dihat ku destên xwe dirêj kiri ba wê xwe bigihandayê. Dîlber di hundurê wî de bû. Lê di jiyane de wê careke din çawa xwe gihandibaya Dîlberê û ew dîsan dîti ba? Ev pirs di serê wî de mazin bû. Ew li ser vê yekê jî dihizirî di hundurê xwe de, da ku çareseriyekê bibîne ku careke din wê bibîne.

Dilşad her weha di vê rewşê de bû. Li ser hespên xwe riyekê dirêj çûn da ku bihatina malê. Di rastiye de riyaya wan bêhtir ne dûr bû. Lê belê ji wan re dûr hati bû. Hevalên wî jî bi wî re di ruyên xwe de didane derve ku rê li wan dûr dihat. Ew jî bi bêdengiyêke mazin û dirêj re riyaya xwe qad kiri bûn. Ji ber vê yekê jî ji wan re dûr hati bû. Berî vê carê gelek carên din hati bûn wê derê ji bo ku bikevine di nav şahiyên de. Lê ve carê ji wan re cuda hati bû. Ji Dilşad re her cudatir bûbû. Ew bi awayekî çû bû û bi awayekî din jî wê kêlîkê divegeriya malê. Wê kêlîkê divegeriyane malê. Lê gelo piştî ku çûna malê pê de êdî wê çî bibe? Hişê Dilşad li paş wî ve mabû. Dihizirî li ser demên pêşiya xwe de ka wê çî bibe. Di ser wî de tiştek ne dihate hişê wî di wê heyamê de. Lê gelek pirs di serê wî de hebûn. Ew jî li ser wan pirsan gelekî dihizirî. Pirsên di serê wî de bûn bersiv dixwastin ji wî di wê kêlîkê de. Lê çî bersiv pê re ne bûn ku bide. Her weha di serê xwe de çû bû û çû bû di nav hiziran de. Di serê xwe de li bersivan digeriya da ku xwe ji bo wan pirsan bibine ku di serê wî de ew pirs bi bersiv bin û ew jî di serê xwe de rehet bibe. Lê lêgerînên wî yên ku di serê xwe de jê re ne dibû çareseriyek di wê kêlîkê de. Têne dihizirî û ji xwe ve diçû û kur diçû di hundurê xwe de. Ma mirov dikare di serê xwe de bi tene ji pirsên xwe re bersivan bibîne? Gava ku pirs der heqê du mirovan de be, wî çaxî hinekî zor dibe ji ber ku di wê rewşê de çî pirsên ku bi xwe re du bersivan dixwazin di wê kêlîkê de. Her weha weke ku di wê kêlîkê de pirsên ku di serê Dilşad de bû çawa ku hizra Dîlberê jî ji bo bersivbûnê dixawze her bi vî awayî re bersivbûneke du alî diviya bû were dayin. Dilşad li ser Dîlberê kûr dihizirî. Dihizir ku ka ma Dîlberê hizra xwe gotiba, wê çî bersiv daba wî her weha di wê rewşê de. Ji bo wan pirsên ku di serê wî de ne bersiva Dîlberê çî bû gelo? Her bersive ku

dida ji di dawiyê de nêzîkatiyeke hizrî ya xwe pê ve dide nîşandan. Wî weke ku dixwast bersiva Dîlberê jî di serê xwe de çêke ka ma wê çawa be. Lê fikir û ne fikir besiveke di serê xwe de çê ne fikir. Vê yekê jî hê bêhtir ew dikire eş û bêtebatiyê de. Bêtebatî weke ku ji xwe xwedyê hinek taybetmendiyan kesane ye ji te xuya dike. Di rewşên weha de bêtebatî hê bêhtir xwe dide nîşandan. Gava ku Dilşad dixwast bersiveke ji dêla Dîlberê jî bibîne û ne didît û vê yekê jî çend jê re zor dihat. Dilşad di serê xwe de her weha xwedyê gelek pirsan bû di wê kêlîkê de. Lê pirsên ku hemûken jî bêbersiv bûn, dihatine xuyakirinê de. Dilşad car bi car ji xwe dipirsi li ser pirsên ku di serê wî de bûn. Her pirseke ku hinekî der heqê Dîlberê de jî bihêne ji dêla wê jî bersiv di serê xwe de çêdikirin. Lê ew bi xwe re li ser wan bersivên ku wî ji dêla Dîlberê di serê xwe de çêkîrine ne qanî bû. Piştî her bersiva ku wî ji dêla Dîlberê di serê xwe de dida, hê zora wî bêhtir dibû. Wan bersivên ku wî di serê xwe de ji bo wê didîtin jî di serê wî de bi xwe re hinek pirsên din dihanîn û bersivên nû yên din ji wan bersivên weke pirsên dixwastin ji wî di wê heyamê de. Her weha di serê wî de pirs li dûv pirsê û pirs û bersiv li dûv hevdu çêdibûn. Bersivên wî di wê kêlîkê de di serê wî de ne dibûn bersiv ji bo yên ku di serê wî de bûn. Her bersiveke ku dihate dîtin lê dibû pirseke di serê wî de. Lê ser hespê xwe bû û di riya xwe de diçû ku here malê. Di riya xwe de li dûrên xwe dimeyizand. Di her meyizandinên wî de di wê heyamê de weke ku bi nêzîkatiyeke bi hevî dimeyizand. Lê di her meyizandinên wî de jê re çî çareserî ne dihate hanîn di wê heyamê de ji bo hizir û pirsên di serê wî de.

Her weha weke heyamekê di riya xwe de çûn. Pişt re bi hizir û ji xweçûbûna di serê xwe de digehin malên xwe. Dilşad û hevalên wî gava ku digehine nêzîkê malan şevbaşî ji hev re dixwazin û jêv

bela dibin û her kesek diçe di malaê xwe de. Dilşad gava ku ji hevalên xwe qut dibe û riya malê digire û têt malê, di rê de li ser hespê xwe hê di hiziran de bû. Hespê wî ew tîne malê. Hespê wî hespekî jîr bû. Dilşad bi wan pirsên ku di serê wî de ne li ser piştta hespê xwe suwar dikeve hewşa malê. Ew bi xwe re barê hespê xwe yê li ser piştta hespê xwe û pirs û hizrên wî ji di serê wî de weke barekî mazin di serê wî de jê re di bin barek wê heyamê de ye. Çend hespê wî barîtiya wî dikir her weha wî ji barîtiya pirsên di ser xwe xwe de dikir. Pirsê bêbersiv barekî giran e li ser mirov. Her weha barê wî jî mirov dikare bêjê ku giran bû. Di serê wî de barê wî çend diçû hê bêhtir jê re grantir dibû. Ji ber bersiv nedîtîne û bêhebûna Dîlberê.. Hebûna Dîlberê di serê wî de mazin bû. Çend dem diçû hê bêhtir di serê wî de mazin dibû û cih digirt. Dîlberê di serê wî de bi gelek pirsên re hebû. Lê di serê wî de bi kêfê mazin re jî hebû. Dîlberê rastiyeke bû di serê wî de. Ew jî bi ve rastiye re bi jînbûne re ne aciz bû. Lê ew ne li nig hevdu bûn û bêbersiv bûn wî aciz dikir. Gava ku dixwast bersiveke bibîne jî, di serê xwe de lê ku di serê xwe de bersiveke çêdikir û digot ev bersiv baş e. Lê jê re ne têt bû, dibû bingeha eş û acizbûnekê li nig wî. Lê divêt em bejin ku ew jî di rewşa xwe ya ku wê kêlîkê dijiya, pir bi kêf bû jî. Ev kêfxweşbûn û pirsên di serê wî de di dilê wî de car bi car li hevberê hevdu bûn. Wî ne dixwast ku kêfxweşiya wî xirab bibe. Wî ne dixwast ku pirsên ku di serê wî de ne, wî gêj bikin. Ji ber ve yekê ji weke ku hinek tirs ji dilê wî de çêdibûn. Ma gelo gava ku ew bêkêf bû, wî çaxî Dîlberê jî ji wî dûr dibû? Ew pirs jî ew bêkêf dikir. Hebûneke her weha xwe pê re dida ber çavan di nêzîkatîyên wî de. Di wan rewşan de jî li desmalka wê ya ku dabûyê de, dimeyizand. Desmalk hinekî dilê wî rehet dikir. Lê ne bi yekcarî bû ev rehetîya ku pê re çêdibû. Gava ku li desmalkê



dimeyizand, Dîlberê dihate bîra wî. Wî jî gava ku ew dihate bîra wî, wî ew di serê xwe de dikire weke wênayekî ku gelekî zelal bû û di hizra wî de bû. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî gelekî bi wê hatina bîrbûnê dilxweş dibû. Di wê heyamê de bi piranî jî xwe ji bîr dikir. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî, êdî ji xwe diçû û ta wî ji dunyayê ne dima. Weke ku here dunyayeke din lê dihat. Hizrên di serê wî de hemû kêmbûn di wê heyamê de. Tenê wênayek dihate ber çavên wî. Ew wêne jî hebûna Dîlberê bû. Gava ku li ser Dîlberê evçend fikir hizra, Dîlberê bi hebûneke rast di serê wî de xwe diyar fikir ku wî digot qey wê kêlîkê ne di hizir de ye, di rastiya jiyane de li nig wê bû û lê dimeyizand, welê lê dihat. Her weha jê re rast dihat. Lê di jiyane de Dîlberê wê kêlîkê ne li nig wî bû. Dîlberê li derekî din bû û ew ji derekî din bû. Ji hevdu wê kêlîkê hinekî dûr bûn. Wî vê yekê di wê kêlîkê de zanibû. Lê weke ku vê yekê ne xwaze bihêne bîra xwe, tevdiqheriya di wê heyamê de. Di serê xwe de gava ku ew di serê xwe de her weha dihizirî, bi vê yekê re pir kêfxweş dibû. Lê car bi car jî gava ku dihate xwe, dimeyizand û Dîlberê ne li nig wî ye, gelekî lê giran dihat. Gava ku dihate xwe, kûr û kûr dikete di hiziran de. Her weha di vê rewşê de hê bêhtir êş dikete di dilê wî de. Ji ber ku ew li nig xwe dihizirî û pişt re dihate xwe û didît ku ew ne li nig wî ye. Vê yekê gelekî tesîreke mazin li ser wî çêdikir. Di wê heyamê de wî xwe hinekî bêçare didît. Ew bêçaredîtin jî jê re gelekî dibû weke êşeke mazin di dilê wî de. Di dil de beçareyî jî nexweşiyekê bêhtir êşeke jî dide mirov bi hebûna xwe re. Ew êşa ku mirov dide erdê û dike nav kul û eleman de bi vê bêçareyiyê re dest pê dike. Bêçareyîti gava ku di dil de bû, êdî di dil de riheki jî dide avakirin. Gava ku rihê bêçarebûne hat avakirin, êdî mirov dikare bêjê ku ketin dest pê dike. Di dilê evîndariyê de hestê bêçareyiyê weke birînekê ye.

Bêçareyî gava ku bi hest û bi rih bû, êdî di hûndur de mayin dibe. Dilşad di serê xwe de xwedyê gelek hizran e ku pê gavên xwe avêtibûn. Lê wê kêlîkê sekinîbû û dihizirî ji xwe re. Dilşad riyeke dirêj qet kiri bû çûbû nav şahiya Newrozê. Li wir bi Dîlberê re hevdîtin çêkiri bû. Pişt re careke din ketibû ser riya xwe de û hati bû malê. Nuha ji li mal bû û di fikaran de bû. Di wan deman de xew neketibû çavên wî de. Nuha dem ber bi sibehê ve bû lê hê ew şiyar bû û li ser cihê xwe rûniştibû. Xew ne dikete çavan. Gava ku hati bû malê jî bêhtir tiştêk ne kiri bû rast e rast riya odeya xwe girti bû û çûbû û xwe di odeya xwe de dirêj kiri bû, lê xewa wî ne dihat. Her weha piştî ku hati bû odeya xwe ji bo ku razahê, lê xewa wî ne dihat. Hema li ser ciha xwe dirêj kiri bû û dihizirî ka ma diviya bû çi bikira. Bêguman diviya bû bihizire, ji ber ku di navbera malbata wî de û di malbata apê wî de nexweşî jî hebû. Ev yek jî diviya bû ji aliyê wî ve pir mazin bihata hizirandin.

Dilşad diviya bû bihizire ku ta çareseriyekê jî bidîtina ji ber ku careke din Dîlberê bidîta. Her weha di hundurê Dilşad de weke ku li ser êgir germ bibe bêsebir bû. Wê çi kiri bana ku ta ku careke din Dîlberê bidîtina? Dîlberê her weha di wê kêlîkê de di serê wî de bû. Hizra wî li wê bû. Çi kiri ba ji hizir û ramana wî ne diçû ser tiştêkî din di wê kêlîkê de. Bi vî awayî re mirov dikare bêjê ku hem ji aliyê hestên wê pir şad û bi kêf bû û hem ji aliyê hiziran ku di serê xwe de fikir ku weke wê çi bibe her weha dibe kifşbûnek. Ev bêkifşbûn ruhê wî teng fikir û gelekî eşkere mazin ji dixiste di dilê wî de. Car bi car ji ber ku ew xwe ji wan bêkifşbûn û tangasiyên ku pê re çêdibûn xwe dûr bike û hew bike pir tahb dida xwe da ku tenê li ser şahiya ku di dilê wî de heye, bi Dîlberê re bifikire û xwe ji tengesiyan û bêkifşbûnên ku çêdibûn, hew bike dida zorê li ser xwe di serê xwe

de. Lê belê ewan nekifşbûn û tengasiyên ku bi wî re xwe didan rû, xwe dûrxistin ji wî re zor dibû. Wan bêkifşbûnî û tangesiyan zoreke pir mazin didanê de. Zora ku pê re xwe dida nîşandan di ser û dilê wî de bi wî re xwe dida der di wê heyamê de. Dilşad mirovekî ku bawermend bû. Mirov jî wî her weha nas dikir. Gava ku diçû derve ji xwe re digeriya û mirov ew didît û wê bi vê dîtinê re nêzîkatiyên ku jê re dihatine kirin, lê dihate meyizandin, ev yek pir baş û mazin dihate dîtin. Mirov gelekî nêzîkatiyeke mazin û gelekî bi rêz jê re didan nîşandan. Mirov hez ji wî dikirin ji ber vê yekê jî çavên wan li ser wî bû. Bi ciwanî û hebûna xwe re ji mirovan re weke mînakeke ku mirov her dem bala xwe didinê de û lê dimeyizandin. Mirov jî bala xwe didan ser wî di wê demê de. Mazinayetî bi wî re di nav mirovan de bi du aliyên re dihate şirovekirin. Bi aliyekî re ciwanî û nêzîkatiya wî dihate şirovekirin. Bi aliyê din re jî hizir û hebûna wî ya di nav mirovan de dihate şirovekirin. Di nav mirovan de rûniştin û hizrên xwe ji mirovan re hanîna ser ziman, ji aliyê hizir û raman ve mazinatiyekê dihêne ser ziman. Dilşad bi vî awayî re gava ku dihate şirovekirin, mirov didît ku xwediyê kesayetiyeke ye ku xwediyê zanebûnê ye.

Dilşad gava ku divegere malê de di dilê xwe de gelekî teng dibû. Bala wî piştî vegerandina wî ne diçû li ser tiştekî ku bikira. Dîlberê di mejiyê wî de bû. Wê şevê ku vegeriyai malê her weha ta sibehê şiyar mabû li ser xwe di odeya xwe de. Gava ku dem gihabû ber sibehê ji nav cihê xwe rabûbû ser xwe. Bi wê zûrabûnê re bala mirov diçû ser wî ku çima her weha zû rabûye. Dilşad rojên din jî zû dirabû ser xwe ji nav cihan. Lê wê rojê di rewşa wî de cûdatiyeke ku xwe baş dida ber çavên mirov hebû gava lê dihate meyizandin. Ji mala bi ahlê malê hemûkan ve her weha ev cudabûn kifş dikirin.

Mirov hema li hevberên wî disekinîn û lê dimeyizandin. Lê çi kesekî ni zanibû ku ka ma çi bi Dilşad re hebû yan jû tune bû. Dilşad zû rabûbû ji nav cihên xwe û bêdengiyek li ser wî hebû ji ber vê yekê jî ev bêdengî ji mirov re asayî ne dihat. Bêdengiya ku pê re bû jî hê bêhtir bala mirov dikişand ser wî di wê heyamê de. Dilşad gava ku zû rabûbû, çûbû ber hênikayiya sibehê ku hinekî ji xwe re bimîne. Şev jî xew ne ketibû çavan de. Ev yek jî ji rûdana wî pir baş û mazin dihate têgehîştin. Mirov gava ku li wî dimeyizand, di wê kêlîkê de gelek tişt ji rûdana wî fahm dikirin. Dilşad her weha gava ku lê dihate meyizandin dihate têgehîştin ku tiştên di dilê wî de hebûn, dihate û ew dikire di hiziran de. Dilşad kurê Sîwan beg bû. Sîwan beg jî birayê Heso Axa bû û ew jî mirovekî gelekî bi sifre bû. Sîwan beg mirovekî ku bi navseriya xwe re mazin bûbû. Sîwan beg birayê Heso Axa yê bin re bû. Lê bin Sîwan begê re hê du birayên wan ên din jî hebû. Ewan jî bi navê xwe yê dûrêne her weha navên wan Hamo û Simo bûn. Simo yê biçûk bû. Lê yê ku gelekî bi zanebûn dihate naskirin bû. Wî xwe dabû zanist da ku bixwîne û pêde biçê bibe zaniyar û alimekî mazin. Baweriya mirov jî bi vê yekê re ji bo wî hebû. Sîwan beg mirovekî gelekî hez dikir ku di nav sewalan de kar û bar bike û ji ber vê yekê jî, jê re navê Sîwan beg hati bû gotin. Lê wêki din jî navê wî yê ji dayikê jî Sîrwan beg bû. Lê mirov bi navê Sîwan beg re ew naskiri bû û di bakirinê. Her weha navê Sîwan jî jê re bû bû weke navê wî ye navokê di demê de. Heso Axa gelekî hez ji Sîwan begî dikir. Lê jêv cûda bû bûn. Sedema cudabûna wan ji bi guftûgoyekê re çê bû. Rojêkê li nig bavê xwe herduyên rûniştî bûn û dikevin guftûkyekê. Guftûgoya wan jî li ser dayika Dilşad bû. Gava ku Sîwan û Kokanar hez ji hevdu dikin Heso Axa li hevberê wan dirabe. Bavê wan bêdeng dimîne di wê heyamê de. Lê Heso Axa

bêdeng na mîne. Heso Axa jî ji ber ku di navebra wan û malbata Kokanarê de li ser hinek erdan pirsgirêk derketi bûn loma jêv dûr keti bûn. Lê gava ku Sîwan beg behsa Kokanarê dike û dibêjê ez hez jê dikim, êdî li wir li bavê xwe Heso Axa û ew dikevin guftûgoyê. Di wê heyamê de gotin ji devê Heso Axa difilite û dibêjê Sîwan beg 'vebre, bese li nig bavê min her weha ne peyive!' Piştî vê gotinê Sîwan beg dilê wî di vê gotinê de diêşe û diçe û êdî ne divegerê malê. Pişt re ku di navbera malbate Sîwan û Kokanarê lihevhatin çê dibe dîsan ew na vegere. Ew ji êdî mala xwe ava dike li nêzîki mala beve xwe di navbera herêma malêbavê xwe û herêma malbavê Kokanarê de. Dilê wî ranagire ku here cihekî din yê dûr. Ji bo ku ji wan dûr ne keve li wir di rex wan de dimîne. Piştî ku Kokanarê û Sîwan beg digehîjine hevdu ji ew erdên ku li ser pirsgirek heyî jî, ji Sîwan û Kokanarê re dimîne. Ewan ji li ser wî ardî malê ava dikin. Gava ku Sîwan malê li wir ava dike êdî ji wê demê pê de gelekî mirov jî mala xwe birin nig malê wan. Di demê de dibine weke eşîrêke mazin di wir de. Navê herêmê ji Sixqê weke ku mirov bi navekî din jî digotin Sarinckê bû. Herêmek pir mazin û xweş bû. Mirov ji bo şevînê sewalên xwe jî dihanîn wê derê di demên sevînê de. Wekî din jî herêmeke ku ji aliyê siniyatîyê ve jî pir dewlêmend bû. Ji aliyê kerengê, tolîkê, xerdelê, qifaran, sirdanokê, nefelê û hwd gelek tîpên giyayê cûr bi cûr lê şin dihat. Nefelê wê derê mazin dibû. Mirov ji wê nefelê reşî jî çê dikirin ji sewalan re û dihilandin. Ji bo sewalan jî li ser latan jî ji bo weke dalavên bi kar bihênin cihên xwarina sewalan jî hati bû çêkirin. Bi vê yekê re jî nîgekî ava jî di wir de diçû. Li gelek cihan jî mirov ji xwe re ji bo ava weke bîran an jî colcûlekan çêkiri bûn. Ji xeynê vê yekê jî li cihên ku av ji binê erdê derdikeve, ji kezin hati bûn çêkirin û di wan kezinan de mast di kîs

de dihiştin. Cihên ku zebeş dixistin di nav avê de ji bo nigidandinê û hwd, hati bûn amadekirin. Her weha bi vî awayî re mirov dikare bêjê ku cihê ku Dilşad û malbata wî têde dijiyan pir xweş bû. Gava ku mirov ji dûr ve li wê derê dimeyizand, mirov digot qey xweza ji bo jînbûna xwe weke merşeke rast kiriye, dihate xuyakirin. Gava ku mirov ji dûr ve lê dimeyizandin jî ew malên ku hati bûn çêkirin di nav wan daran de bi hev re û bi wê sinatîyê re dîmenekî ku ji mirov re gelekî xweşik dihat ber çavan. Ji bo jiyanê jî her weha ji her alî ve derfetên mazin hebûn. Her kirinek di nav wê jiyanê de bi awayekî xwezayî re bi kar û barê xwe ve diçû û dihat. Riya çi kesekî li ya çi kesekî ne dibû asteng. Her kesek di rewşa xwe de diçû û dihat. Her weha mirov dikare bêjê ku piştî ku Sîwan beg li wir bi cih bûbû êdî pişt re pergala jiyanê jî li wir hati bû avakirin. Merc û hoyên jiyanê jî li wir mazin bûn ji ber vê yekê jî zû li wir bûbûn mirov û gelek û pêş ve diçûn. Dilşad demên xwe bi piranî li wir dibuhurandin. Lê bi gelek jî li aliyê mala apê xwe dima. Gelek hevalên wî hebûn li wir .Car bi car li wir dihatine nig hevdu û ji xwe re dirûniştin û dema xwe dibuhurandin. Car bi car jî li cihê mala Dilşad digihan hevdu û ji xwe re digeriyan li beyaran. Li nêzîkê wan daristaneke jî hebû. Gelek caran jî ji bo nêçîrê diçûn nêzîki daristanê bi hev re.

Dilşad wê sibehê zû rabû bû û xwe bû ber hênikayiya sibehê ji der ve. Sibeh li wir gelekî xweş dibû. Sibehê gava ku hê ji nûke ve dihate rabûn, xwezayê bêhneke xweş bi dimena xwe re dida mirov. Lê wê sibehê hizra Dilşad ne li wir bû. Gava ku zû rabû bû çû bû ber sintekê ji xwe re bi tene rûniştibû bû. Ta ku tav derketibû û her der hêdi hêdi germ bûbû li wir mabû. Piştî germê re êdî ew jî ji cihê xwe rabû bû û çûbû hindûrû de ku taştêya xwe bixwe bi bavê xwe re. Lê bi hizir bû. Gava ku hat hundur jî dît ku bavê wî ji xwe kar fikir ku li

ser xwarina taştê rûne. Gava ku hat hevberê bavê xwe jê re rojbaş got û pişt re ew jî çû û li nig bavê xwe rûnişt li ser sifra taştê bi wî re. Bavê wî gava ku ew rûnişt lê meyizand. Lê ji wî re çî gotin ne got. Her weha bêdengî li ser sifra xwarinê hebûna xwe berdewam kir di navbera wan de. Dilşad li ser sifrê pir bi hizir dihate xuyakirin. Bavê wî devê xwe vekir weke ku bipeyive bi wî re nê ne dipeyivî, tiştê ku di serê wî de jî her weha di serê wî de ma. Hizra ku bavê wî ku di serê xwe de çê kir ku her weha jê re bêjê dîsan bi xwe re di serê xwe de hêştî bû û ne gotî bû. Dilşad ta ku li ser sifra taştê bû çî gotin ji nav lêven wî derneketin. Bavê wî car bi car berê xwe dida Dilşad û li wî dimeyizand. Her carê ku lê dimeyizand jî weke ku bixwaze tiştêkî jê re bêjê lê dimeyizand lê tiştêk ne digot. Dilşad gava ku ji nav şahiyê ji bo ku wherê malê derdikeve bi hevalên xwe re piştî dana razanê digihê malê. Lê bi sibehê re hê dana paza rabû bû û li ser lingên xwe bû. Bavê wî gava ku li ruyê wî dimeyizand, fahm dikir ku bi şeve xew ne ketiye çavên wî de, ta wê kêlîkê ku li nig wî li ser taştê sekinî bû. Gava ku sibehê Sîwan beg dirabû ser xwe de amadekariyên xwe dikirin û dihate ser sifrê de da ku taştê kiri bana. Piştî taştê hat xwarin êdî Sîwan beg li odeya mazin ya civatê dirûnişt û hêdi hêdi civata wî lê digaha hevdu. Gava ku civat li hev giha êdî ew derdikete ji derve û diçû nig hevalên xwe ji bo ku bi wan re were nig hevdu. Piranî jî derdiket diçû nig hevalê xwe yên ku li nig saydayê wî dixwandin. Piştî demê taştê hevalên wî piraniya li nig seyda li hev digahan û fêrên xwe dihildan. Dilşad gava ku diçû li nig seydayê xwe, her weha piraniya di demê fêran de diçû da ku li fêran guhdar bike. Ew bi xwe re jî dema fêran bingeh buhurtibû bû. Ew gihabû demê ku pitûken mazin bixwêne û li nig seydayê xwe û di nav hevalên xwe de li ser wan pitûkan bipeyive. Hevalên wî,

hinekan ji wan piştî ku perwerdeya xwe ye bingehîn hew kiri bûn êdî çûbûn Cizîra Bota ji bo ku perwerdeyeke hê maztir hildin. Gelek caran bavê Dilşad jî di nav axifçinên xwe de gava ku bi wî re dipeyvî digot ku divêt tu jî herî Cizîra Bota. Mirov navê Melayê Cizîrî hez kiri bû û çend mirov bi zanebûn jî bû dihate zanin ji aliyê mirovan ve. Her weha zanistvanên mazin li Cizîra Bota dimînin. Berî hingê hinek suwarên Mîrê Bota di wir ve çûbûn. Mirovên ji herêmê, her weha gelek mirovên ciwan bi wan re şandi bûn Cizîra Bota. Gava ku suwaren mîr di wir ve hatiba û ciwan bi wan re çûba wî çaxî ji bo ewlekariyê ciwanên baş hebû. Her weha car bi car suwarên Mîrê Bota digeriyan li herêman. Mirov gava ku ew didîtin jî bi wan re bi dilrehetî zarokên xwe dişandin. Her weha carekê gava ku suwarên mîr di wir ve diçin, hinek hevalên Dilşad jî bi wan re çûbûn Cizîra Bota ji bo xwandina xwe berdewam bikin. Gava ku hevalên Dilşad çûbûn wî çaxî hê Dilşad fêrên bingeh dihildan. Lê li ber hewbûnê bû. Sedayê wî jî mirovekî ku perwerdeya xwe ya mazin li Cizîra Bota hildabû. Seydayê wî demeke dirêj li Cizîra Bota mabû ji bo fêrbûna zanist. Navê seyda Feqî Seîd bû. Lê piştî ku perwerda xwe ya bingehî hew dike, pişt re mirov jê re digot Mele Seîd. Mele Seîd mirovekî ku zanebûna xwe pêş xistibû Di zanista zanebûnê de xwe kûr kiri bû. Lê mirov ku bêhtir pêwîst ne dîti ba ne dipeyvî. Mirovekî bêdeng bû. Baweriya mirov jî gelekî lê mazin bû. Dilşad li nig wî bingeha xwe ya perwerdê hilda bû. Dilşad gelekî hez ji seydayê xwe dikir. Mele Seîd mirovekî ku bi Melayê Cizîrî re ji mabû bû. Lê gelek kal bû bû. Ji aliyê zanist ve bihêne an ji aliyê kalbûne ve jê re rez dihate girtin. Gelek caran jî di nav civata mîr de rûniştî bû û dipeyvî. Mirov gava ku dipeyvî jî pir lê dihesandin. Ew rewşa wî ya bêdengiyê jî jê re di nav civatan de yan jî li dûrên wî dijiyan, dibû bingeha rêzeke mazin



ji bo wî di nav xelkê de. Mirovekî xwediyê hizra rast bû. Gelekî li ser xwendina mirov ku li nig dixwandin di dirawestiya. Bi gotin û zimanê xwe re fêrên ku didan baş û qenc dida rewakirin.

Dilşad gava ku bi bavê xwe re taştê xwari bû û hinekî ji li nig rûnişti bû pişt re çûbû nig hevalên xwe yên ku dixwandin. Piştî ku wan jî xwandina xwe hew kiri bû, êdî dabûn rex hevdu û derketibûn derve bi hev re. Dilşad jî û hevalên wî jî mirovên ciwan bûn. Gava ku bi hev re ne çûban nêçîrê yan jî her weha dernên din, dihatine nav civatê û ji xwe re dirûniştin li gotina mirovên mazin dihesandin. Ew jî êdî mirovên mazin bûn û simbêlên wan derketi bûn. Gava ku simbêlên wan dest bi derketinê fikir, êdî ew jî ji mazinan dihatine jimartin. Êdî biçûk ne dihatine dîtin. Her weha ji wan êdî hêviyeke mazin dihatine kirin. Gava ku her weha simbêlên wan derdiket, êdî hêdî hêdî diviya bû ku ew xwe li ser linga bigirtana di jiyane de. Ji wê demê pê de êdî kêmasiya ciwanan jî weke yên mazin dihatine rexnekirin. Nêzîkatiyeke çawa li mazinan bi hatine kirin. Êdî li wan jî her weha nêzîkatiyeke wilo mazin dihate kirin. Gava ku yekî piştî vê demê wir de êdî kêmasiyek kiri bana jê re dihate gotin ku 'ne êdî simbelê te derketine!'. Wateya vê gotinê jî her weha 'êdî tu mazin î û divêt tu bibe xwedî berpirsiyariyan ku li pêşiya te ne, ma çima çî her weha bêberpirsiyar tu digerî'. Demê simbêl derketinê demeke weke ku ji dema ciwantiyê derketin û ketina demeke nû dihate pêjirandin. Dilşad her weha di dema xwe ye ku mazin dibû. Hizra wî û dilê wî mazin bû. Mirovê ku ne berberpirsiyar bû li hevberê rastiyan û pirsgirêkan. Wateya rastiye û jiyane di serê wî êdî xwe girti bû. Bi vê yekê re mirov dikare bêjê ku mirov bizane û bi berpirsiyar jê derketibû. Ji malbata wî û ji mirovên dûrên wî ji hêdî hêdî hêvî jê dihate kirin. Gava ku gavên xwe di avêtin ji aliyê

mirovên dûrên wî ve dihate dîtîn. Qençiyek kiri bana mazin dihate şirovekirin û kêmasiyek jî kiri bana her weha mazin dihate şirovekirin. Her weha mirov heger bêjê ku ji aliyê kesayetiya xwe ve li ber çavan bû. Ji bo ku mirov her weha di ber çavan de were buhurandin tenê hebûna wî û zanebûna wî ne sedem bû. Ji xeynî wê yekê jî malbeta wî ji sereke bû û ev sedemek bû ji bo wî di vê rewşê de. Malbeta wî malbeteke ku bi nêzîkatiyên xwe re li ber çavan bû. Bi malbata xwe re ew jî li ber çavan bû. Ji vî aliyê ve jî li ber çavan girtina wî xwedî wate bû. Dilşad her weha ji gelek aliyan ve li ber çavan bû. Lê Dilşad divêt mirov bêjê ku di nav mirovan de ne weke kurê begekî yan jî her weha maleke mazin tevdigeriya. Mirov her weha bû ku li gor kesayetiya xwe ttevdigeriya di nav mirovan de. Mirov ev yek baş û qenc didît. Ji ber vê yekê jî hez jê dikirin. Mirov ku xwe mazin û qabih dîti bana di nav mirovan de bêhtir çi rêzê ne didîtîn. Dibit ku li nig wan ne hatiba gotin ka mirovekî çawa ye. Lê bi nêzîkatiyan re mirov kûr fikir ku ew rastiyê bibine û fahm bike. Lê herêkirina wan jî bêguman di serên xwe de bêhtir ne dihate kirin. Herêkirin ku di serên de ne dihat kirin êdî sereketiya wan jî bi zorê re bidest meşê fikir. Têgehîştin û xwe dana herêkirin du taybetmendiyên ku di nav civakê de ji bo reveberiyên herî mazin bûn. Bê têgehîştin û xwe nedana herêkirin diketine reveberiyê de tenê li ser hêzeke bûyina xwe dida herêkirin. Di vê rewşê de jî zor ji bo pirsgirêkên çareseriyê herî mazin dibe. Mala bavê Dilşad xwediyê hêzeke mazin bûn di nav civakê de. Lê bêguman rojekê ji mirov ne dît ku wî ji devê xwe derxist û got ku ez ji maleke mazin im. Mala mazin bi zanebûna mirovên malê re xwe bi wate fikir. Her weha zanebûna mirovên mazin hebû. Yê ku Dilşad di nav mirovan de xwedî rêz kiri bû jî, her weha zanebûna wî bû. Di

nav mirovan de zanibû bipeyive. Mirov ku di nav mirovan de zanibû bipeyive, ji xwe re rêz çêdikir. Lê bi vê yekê re nêzîkatî jî gelekî mijareke girîng e, ku divêt mirov bihêne ser zimên. Nêzîkatiyên wî jî xwediyê wateyêke mazin bûn. Bi nêzîkatiyên xwe re, ne xwe ji mirov dûrdixist an jî mazin dida nîşandan. Wê yekê jî wî di nav mirovan de mazin dikir. Mirovekî ku di nêzîkatiyên xwe de ji dil bû. Bi wan taybetmendiyan xwe re Dilşad di nav mirovan de xwe mazin kiri bû. Bi wan taybetmendiyan re gava mirov li kesayetiya wî dimeyizand, mirov didît ku xwe bi bingehe kiri bû. Li ser wî bingehe ku bi xwe re çêkiri bû, nêzîkatiyên xwe didane nîşandan. Mirov bi vê yekê re, rez didanê de. Mirovekî ku hê ciwan bû. Lê divêt mirov bêjê ku bi wan nêzîkatiyên xwe re mirovekî ku jê mazintir jî bûn, rêz didanê de. Gava ku çûbû nav şahiya Newrozê jî her weha ji ber vê yekê bû ku mirov çawa ku ew dîtibûn, ew dawetî rûniştina li nav mazinan kiri bûn. Vê nêzîkatiya mirov karê bi vê yekê re şirove bike. Dîlberê jî ji wan aliyên ve navê wê naskirî bû. Divêt mirov bêjê ku bi vî awayî re di dilê wê de cih girti bû. Dilşad di dilê wê de berî ku wî di şahiyê de bibîne cih girti bû. Lê ji ber ku malbetên wan jêv xeyidî bûn, tenê di dilê xwe de hêştibû. Ev xeyda malbatên Dilşad û Dîlberê bûbû bingeha bêdengiya wê di dilê wê de. Lê di serê wê de hêdî hêdî hizra wê jî mazin dibû. Her weha wêrbûna wê ji çêdibû. Dîlberê miroveke ku bi mejiyê xwe re miroveke ku gelekî şareza û qenc bû. Her weha dihate naskirin.

Dilşad û Dîlberê hê ji biçûkatî ve hevdu nas kiri bûn. Zarokatiya wan bi hev re mazin bû bû. Di demên zarokatiya xwe de gelekî bi hev re bûn û di leyistin. Lê piştî ku di navbera malbatên wan de xirabûn çêdibe, êdî jêv diqacihin. Lê çend dem jî ji ser hev veqetîna wan re diçe jî, dîsan hevdu ji bîr na kin. Kesên her weha bûn, ku hê

di biçûkatiyê de hevdu nas kiri bûn. Dîlberê miroveke ku gelekî bi hest bû. Kesayetiya wê kesayetiyeke bi hest bû. Mirovên bi kesayetiya bi hest, zû bi zû tiştên ku pê re ne, dihênin jînkirin. Dîlberê jî her weha ji zaroketiya xwe ve çî jîn bû bû di mejiyê wê de bû. Dilşad jî her weha mirov dikare bêjê ku yekî bi kesayetiya hestperwer bû. Mirov dikare di vê xalê de ji bo wî bêjê ku mejiyê hestiyar bi wan re peşketî bû. Mejyê hestiyar bingehê xurt bi wan re dabû avakirin. Ji ber vê yekê bu ku gava Dîlberê û Dilşad hevdu dîtibûn, weke ku berê gelekî hevdu dîtibûn li wan hati bû. Gava dihênin hevberê hevdu bi Dilşad re jî û bi Dîlberê re jî ji bo hevdu hestiyariyeke hevnasîn a mazin xwe bi wan re dabû nîşandan. Bi meyizandinekê ku te digot qey ji dema ku ji hevdu qatahane, li hevdû dihizirîn, li hevdû dimeyizandin.

Dilşad ji şahiya Newrozê bi hestiyariyeke mazin vegeriya bû malê. Gava ku vegeriya bû malê jî mirov hemû jî fahm dikir ku cudatiyek pê re heye. Piştî şahiyê û dîtina Dîlberê re cudatiyeke mazin bi Dilşad re çêbû bû. Piştî şahiyê pê re bêhadanî mazin bû bû. Li ser taştê bavê wî ev yek baş û mazin fahmkiri bû. Dibit ku bavê di wê heyamê de wî gava karkiri bû ku bipeyive hingê jê pirsîba, ka ma sedema vê bêhadanbûnê çî ye ku xwe pê re dide xuyakirin. Lê wî jî tiştê jê ne pirsî bû. Her weha tiştê xwastibû ji wî bipirse yan jî gotibana di serê xwe de hêştibû. Lê mereq jî pê re hebû, ji ber ku ka ma çima her weha Dilşad bêdeng bû. Lê xwe bi mêreqa xwe re hêştibû. Carina mereq xwediyê zoreke pir dijwar e. Gava ku mirov xwast bipirse û mirov ne pirsî wî çaxî dijwaritiya mereqê dest pê dike. Bi bavê wî re jî her weha mereqa dijwariyê xwe bi xwe re hêşti bû. Dilşad gava ku bi bavê xwe re rabû bû çû bû odeya rûniştinê jî carekê bavê wî karkiri bû ku jê bipirse, ka ma çiyê wî heye, lê dîsan

xwe girti bû û tiştê ne pirsî bû. Dibit ku li hêviya wî bû, ku ew bi xwe jê re tiştan bêjê. Lê Dilşad ji hizra wî wê kêlîkê ne li wir bû ku vê yekê fahm bike. Di serê xwe de hizra wî li ser Dîlberê mabû. Dîlberê gelekî di ser û dilê wî de cih girti bû. Piştî ku civatê bavê wî lihev gihabû hevdu û pişt re ew jî ji wir karkiri bû ku veqete here nig hevalên xwe, lê hê jî bavê wî li hêviyekê bû ku ew bi xwe tiştê jê re bêjê, ka ma çî bi wî re heye. Lê Dilşad jê re çî gotin ne gotîbû û ji nig veqetiya bû. Rewşa wî bavê wî jî kiri bû nav fikaran. Ne bavê wî û ne ji mirovên ku ew nas kiri bûn berê hingi Dilşad her weha bédeng ne dîti bûn. Ji ber vê yekê jî mereqan dikirin. Dilşad gava ku hati bû nig hevalên xwe jî her weha rewşa wî, ji rû û tevgerên wî dihate têgehîştin. Bi vê yekê re bala wan jî çûbû ser wî di wê heyamê de. Weke hevalên wî seydayê wî jî ji bédengiya wî fahm kiri bû ku tiştin di serê wî de bûn. Seydayê wî gelekî ji vê yekê bû ku gava ku Dilşad dabû devê derî û hati bû hundurû û gava ku rûniştî bû, gotîbûyê ma ti çawa yî. Lê Dilşad gelekî bi hizir bû. Dilşad her weha weke qederekê bi hevalên xwe re dimîne û bi wan re digere. Pişt re ku dibe ber êvarê, êdî ew jî kar dike ku were malê. Lê ji rewşa wî dihate têgehîştin ku ne rehet bû. Bi ber êvarî re Dilşad ji hevalên xwe diveqete û tê malê. Lê hevlekî wî jî pê re tê malê. Ew hevalê wî yê ku pê re tê malê hevlek ji wan hevalên wî ye ku di şahiyê de pê re bû. Dilşad gava ku bi hevalê xwe re hat malê, bi hevalê xwe re buhurîn odeya mazin, ya ku di rex odaya civatê de ye, lê ji bo xwandin û nivisînê bi kar dihate hanîn. Dilşad bédeng bû. Wê kêlîkê çî gotin ji nav lêvên wî ne derdiketin. Dilşad gava ku bi hevalê xwe re buhurtin odeyê bi hev re li wir hinekî rûniştin û ji xwe re peyivîn. Dilşad bi hizir bû. Dilşad û hevalê wî di odeyê de weke heyamekê mebûn. Di odeyê de rûniştî bûn û ji xwe re dipeyivîn.

Dilşad û hevalê xwe yê ku pê re ye bi hev re weke heyamekê li odayê dimînin, êdî pişt re ji odayê derdikevin. Gava ku ji odayê derdikevin dihên odeya ku lê civat kom dibû. Bavê Dilşad jî li hevberê wan di nav mirovan de bû û ji wan re dipeyvî. Dilşad û hevalê wî jî gava ku rûnişti bûn, çî deng ji wan ne diderket. Bêdeng di cihê xwe de rûnişti bûn û dihesandin. Dilşad dikir ku guhê xwe bide axiftinên bavê xwe, lê wê kêlîkê ev yek weke ku jê re hinekî zor dihat. Di serê wî de hinek mijarên din hebûn û hizrên wî li ser wan mijarên bû. Vê yekê jî ne dihişt ku kari ba ku li ser axiftinên di civatê de dihatine kirinê bihizire. Dilşad di cihê xwe de rûnişti bû û car bi car jî ji xwe ve diçû di cihê xwe de. Hevalên wî yê ku li rex wî rûniştî bûn, car bi car jî fahm dikirin, ku Dilşad di serê xwe de çûye derne din. Gava ku ev yek ji aliyê hevalê wî ve dihate têgehîştin, hevalê wî jî destê xwe li milê wî didan û ew bi bal dikirin li ser peyivtinên ku dihatine kirin di wê heyamê de. Lê gava ku li Dilşad dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku lê zor dihat ku hizra xwe bide li ser dora xwe û bihesîne. Lê wî ji dida xwe da ku xwe bide hesandin. Wî li wan mirovên ku dipeyvîn dihesand, lê belê bala wî jî ne li wir bû û ne li hawîrdora wî bû. Dilşad mirovekî zane bû. Ji xeynê vê yekê jî ji aliyê rêzdayin- û hildanê ve jî, mirovekî ku baş dihate naskirin bû. Nêzîkatiyên wî baş û mazin dihatine dîtin. Dilşad kurê Sîwan beg bû û li nig Mele Seîd xwandibû. Ev herdu taybetmendî bi serê xwe re jî, wî baş û mazin dihanî ber çavên mirovên ku li dora wî bûn. Gava ku di nav civatê de rûniştî bû jî, dihate dîtin, ku bala wî li hinek kesan bû, ku di nav civatê de rûniştine. Ev yekê wî ji gava ku li hawîrdora xwe dimeyizand, fahm dikir. Gelek caran jî gava, ku li dora xwe dimeyizand, didît ku bala mirovan li ser wî bû. Wî jî weke ku ji wan re bide nîşandan, ku bala wî jî li ser wan e, destê xwe dibire ser

simbêlên xwe û bi rewşekê re ku weke ku li ser gotinên wan dihizirî.. Her weha Dilşad ta ku civat li dar bû, li nav civatê mabû rûniştibû bi hevalê xwe re. Ber bi dana razanê ve civat êdî dest bi ji hev belavbûnê fikir. Gava ku bû dana razanê, civat hemû ji hev belav bû. Gava ku civat tev rabûn û çûn ber bi malên xwe ve, êdî Dilşad jî karê xwe kir ku here odeya xwe ya razanê û xwe dirêj bike. Gava ku civat tev ji hev belav bû û mirov dest bi çûna malên xwe kirin, êdî Dilşad jî ji bavê xwe re şevbaşî xwastibû û çûbû odeya xwe ji bo ku xwe dirêj bike. Dilşad gava ku ji odaye civatê derket, hevalê wî jî bi wî re derket. Hevalê xwe bire ta devê derî û lê şevbaşî kir û ew jî vegeriya û çû odeya xwe ji bo ku xwe dirêj bike. Lê xew jê re tune bû. Hinekî wastahî dihate xuyakirin. Di serê wî de gelek hizir û efkar hebûn. Ji ber vê yekê jî di serê xwe de ne rehet bû. Gava ku hati bû odeya xwe tenahî bi dilê wî wê kêlîkê girti bû. Tenahî ku êş didayê de, lê serwer bû bû. Çi kiri bana ku wê xwe ji wê tenahiyê hew kiri bana? Bersiva vê pirsê di serê wî de weke ku bi bersiv bû û ne bê bersiv bû. Gava ku Dîlberê dihate bîra wî, weke ku bersiva pirsê di serê wî de çêdibû. Lê gava ku di wê rewşê de xwe bi tene didît jî, êdî weke ku pirs bêbersiv maba lê dihat. Gava ku ew dihizirî kûr û kûr dihizirî. Di serê xwe de gelekî kûr diçû û dihizirî. Her weha piştî ku hati bû odeya xwe ya razanê û xwe li ser cihê xwe dirêj kiri bû, giraniyekê jî pê re dest pê kiri bû. Xew li ser çavên wî weke ku ne bû. Mejiyê wî ji gelek aliyan ve dihizirî û bi lebat bû. Li ser cihê xwe dirêjkirî li ser xwe re dimeyizand û dihizirî. Esreqe weke ku wêneyên li ber çavan wî çike lê dihat. Li esreqe gava ku dimeyizand, di serê wî de gelekî wêneyên bi hizirên ku di serê wî de hebû çêdibûn. Ewan wêneyan jî gava ku di serê wî de çêdibûn, wî di nav fikaran de kûr dibirin û dibirin. Esreqe wê kêlîkê li ber çavan wî dibû weke tabloyekê

gelekî mazin. Ji hizirandinê êdî gelekî westiya bû. Bi meyizandina li esrege re hêdî hêdî giranî xwe di ser wî de diberda. Heyamekê, bi hizir û ji xwe çûndinê re û bi meyizandinê re dikeve xewê. Ketina wî ya xewê ji wastandina wî dihat.

Ew şev Dilşad ta ber sibehê dimîne razahî. Lê ku hêdî hêdî rohnî derdikeve êdî ew jî ji xewê dirabe ser xwe. Lê gava ku ji xewê rabû bû, hê çî kesek ji xewê ne rabû bû. Gava ku şivanên kar kiri bû ku sewalên xwe ji koxan derxin, dengên wan diçû wî di wê heyamê de, êdî ji wî dengî ew ji xewê rakiri bû. Gava ku Dilşad ji xewê rabû bû, serê xwe rakiri bû û teqînek da bû ji derve. Gava ku Dilşad diq kiri bû dîtibûn, ku şivan sewalên xwe ji koxan derdixistin, ku bibin çolê. Çend pezên wan ji koxan derdiket tura tura şivanan jî bêhtir dibû. Pezên wan gava ku derdiket, weke tura tura wan fahm dikir, ku wan bi kîjan aliyê ve dide, ew jî bi wî aliyê re riya xwe digirtin û diketine di ser rê de û diçûn. Gava ku pezên hemûkan derket, êdî ji êvarî ve hê pezên ku nû hatîbû duhçin xatûnên ku sîtil di destên wan de, dihatin da ku pezên bidoşin. Gava ku pezên ku dihate dotin, êdî weke heyamekê ku çêlek bihêne, golikên wan diberdan berde, ku hinekî bimihên. Lê ku mih bihêne berxik û bizin jî bihêne kahrikên wê diberdin da ku herien hinekî bimihênin. Lê pezên ku ne dihate dotin, weke gîskan jî dihatine neqandin û derxistin ber pezên ku wêrin dotin. Bi vê yekê jî re gava ku pezên ku ne dihate dotin weke beranên, nêriyên û gayên hê zû dihate derxistin. Ji koxa sewalên mazin û yên ku ne dihatina dotin jî, her weha weke nêriyan û baranên, conegayên û nahkunan jî zû dihatine derxistin. Sewalên ku ne dihat dotin, li hêviya sewalên ku dihate dotin ne dihat hiştin, ku bi hev re bê derxistin. Gava ku li hêviya hevdu hatiba hiştin, êdî wê hinekî ji wan re zahmet bûba. Ji ber ku ne be zahmet jî, weke



komeke ku neyêne dotin pêşî û yê ku dihate dotin jî pişt re weke komek dihate derxistin. Her weha ji ber ku nebe zahmet ji wan re di serî de. Bi vî awayî re naqandinek dihate kirin. Ev naqandin jî ji êvarî ve dihate kirin. Şivanên her weha zanibûn ku ka wê çawa bikin.

Dilşad gava ku rabû ser xwe û xwe amade kir ku derkeve ji derve. Lê berî ku derkeve jî çawa ku xwe amade kiri bû li ser keviya nivînên xwe bêdeng rûniştibû. Bi rûniştina xwe re gelekî dihizirî. Dilşad her weha weke heyamekê li ser kaviya nivînên xwe rûniştî bû û ketibû nav fikaran de dîsan. Dengên xatûnan û zarokan gava ji derve hinekî bêhtir bûbû, êdî li dengên wan hati bû ser xwe ji xweveçûna xwe de. Dilşad gava ku hat ser xwe ve êdî ji ser nivînên xwe rabû û berê xwe da devê derî û derkete ji derve daku here hinekî behn bi wê hênikayiya sibehê re bikişêne hundurê xwe de. Dilşad gava ku derkete devê odeya xwe bi bavê xwe re rû bi rû hat. Bavê wî ji rabû bû û kar kiri bû ku here ji derve hinek behn bistêne ji xwe re. Gava ku Dilşad bavê xwe dît, jê re got rojbaş. Bavê wî jî jê re got roj baş. Pişt re gihane hevdu û dana rex hevdu û çûn derve da ku hinek saqe ya paqij bikşênin di hundurê xwe de. Dilşad û bavê wî dana rex hevdu û çûnen ji derve û ji xwe re hinekî li bin wê saqeye hinik dest bi gerandinê kirin. Bavê Dilşad gava ku di rex wî de dimeşê, lê bi meyizandineke ji dil lê meyizand. Pişt re bavê Dilşad li ser wî zivirî û jê pirsî; 'kurê min ma tu çawa yî?' Dilşad li bavê xwe zivirî û bersiva wî da û got 'ez baş im yabo.' Bi vî bersivê re bavê Dilşad weke ku xwast ku fêr bibe, ku ka ma çî bi wî re heye. Lê Dilşad tiştê ne goti bû. Piştî wê pirs û bersivê re, bêdengiyê kin di navbera wan de çê bû. Dilşad ew bêdengî xira ne kir, lê bi wê bêdengiyê re li bavê xwe meyizand, weke ku bixwaze jê re tiştê bibêjê. Lê çî gotin ji nav

lêvên wî ne derketin. Her weha di meşê de weke du sê caran Dilşad bi wate li bavê xwe meyizandi bû. Bi vî awayî re weke heyamekê bêdeng ji xwe re di bin saqeya sibehê de geriyan. Piştî ku tav hinekî derket, êdî ew jî berê xwe dane hundurû ku herin taştêya xwe bikin. Wan jî bi vê yekê re berê xwe dane hundurû û hatine hundurû ku taştêya xwe bikin. Gava ku hatine hundurû dîtî ku sifrêya taştê wa ye hati bû amadekirin. Dilşad û bavê wî bi hev re buhurîn ser sifrê. Dilşad hîna jî pir bi hizir dihate xuyakirin. Bavê wî jî vê yekê baş û qenc didît. Ji Dilşad ta wê kêlîkê tiştek di haqê vê bêdengî û hizirandina wî de jê ne pirsî bû. Dibit ku li hêviyê bû ew bi xwe jê re bêjê, ka ma çiyê wî heye.

Dilşad bêdengiya xwe xira ne kir û tiştek ji bavê xwe re ne got. Her weha bi vê rewşê re taştêya xwe hew kirin bi hev re. Gava ku taştêya xwe hew kirin ji ser sifra taştê bi hev re rabûn û çûnen odaya civatê rûniştin. Dilşad jî bi bavê xwe re bû gava ku hati bûn odaya civatê ku ji xwe re rûnihên. Dilşad gava ku bi bavê xwe re hati bû odaya civatê bêdeng di kurçîkekê de ji xwe re bi wê rewşa xwe ya bi hizir rûniştî bû. Her weha weke heyamekê di cihê xwe de bi bêdengiyekê re ji xwe re rûniştibû. Piştî heyamekê ku rûnişt êdî ji cihê xwe rabû ser xwe û berê xwe de devê derî ku here ji derve. Bavê wî kifş kir ku Dilşad wê derkeve. Wî jî bi dengêki nerm bang kiriyê de û jê pirsî; 'kurê min tê çi kê?' Dilşad bersiva bavê xwe da û gotiyê de; 'yabo ez ê çime derve.' Dilşad gava ku bersiva xwe da û berê xwe da devê derî û derket, gelekî bi hizir dihate xuyakirin. Gava ku derket devê derî, bi du hevalên xwe re rû bi rû hat. Hevalên wî lê meyizandin. Bi meyizandinê re slav dane hevdu. Lê çi gotin di wê heyamê de ji devê wan ne derketin. Dilşad gava ku li pêpeloken devê derî bû, berê xwe da bû cihê ku hespê wî lê dima. Hevalên wî

jî gava ku ev yek dîtîn, êdî wan jî da dûv wî. Gava ku Dilşad giha nig hespê xwe û kar kir ku seferê hespê xwe lê bike, hevalên wî jê pirsîn, ku wê çi bike. Dilşad gava ku hevalên wî jê pirsîn wî li aliyê cihê ku Dîlberê ve meyizand. Gava ku meyizand, hevalên wî têgehîştin ku wê çê ku. Wan jî karê xwe kirin, ku pê re herin, Dilşad gote wan ‘ma hûn ê wêrin çi kin? Ne gerek e ku hûn wêrin!’ Lê dîsan hevalên wî gotinê de em ê werin. Gava ku her weha wan jî got em ê jî wêrin, Dilşad tiştêkî din ji wan re ne got. Hevalên wî gotin em ê jî werin, êdî ew jî çûn ku seferê hespên xwe lêkin û xwe amade bikin û pê re herin. Dilşad seferê hespê xwe li piştê kir û li ser hespê xwe suwar bû û kete ser riya ku here navenda ku malê bavê Dîlberê lê ye. Gava ku li hespê xwe suwar bû û derkete derve, çawa ku weke se çar gavan çû, êdî dît ku hevalên wî jî li ser hespên xwe, ber bi wî ve tên. Hevalên wî çawa ku ber bi çavan ketin, êdî gîhane wî û bi hev re ketine ser rê ku herin aliyê din, ku Dilşad bi Dîlberê re hevdîtînê çêke. Gava ku hatine ser rê, êdî, hespên xwe dana bi bazdanê. Dilşad li ser hespê xwe bi Lezê diçû. Gava ku di wê heyamê de jî li ruyê wî dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku gelekî bi hizir bû. Lê li ser hespê xwe gava ku diçû, dihate dîtîn ku dilperiyêke mazin jî pê re hebû. Di wê kêlîkê de ruyê wî hinekî fihêtokî dihate xuyakirin. Dilşad ne mirovê ku ji xwe ne bawer bû. Mirovê ku ji xwe pir bi bawer bû. Ew fedya ku li ser ruyê wî dihate xuyakirin jî, ji dilperiya di dilê wî de dihat. Dilperiya di dilê wî de pir mazin dihate xuyakirin. Bi wê dilperiyê digot qey ne li ser hespê xwe suwar bû diçû, digot qey bi hespê xwe re bi bazînê diçû. Bazîn di dilê wî de bi wî re hebû. Lê gava ku mirov li ruyê wî di wê heyamê de dimeyizand, mirov didît, ku gelekî jî dihizirî. Li ser hespê xwe bêdeng û lezê re diçû. Li ser hespê xwe hevaleyê wî kar kir ku

bipeyive. Du sê gotin jî gotin. Lê vê yekê têne bi wî re ma. Dilşad di serê xwe de weke ku ji xwe ve çûbe dihate xuyakirin. Hevalên wî yên din jî êdî bédeng man. Bi Dilşad re bédengiyekê wilo dihate xuyakirin ku mirov digot qey ku dengê derketiba weke ku camek bişkê û bi şikestina xwe re, gelek qatên her weha wê ezmûneke pir mazin bihaniya bi xwe re. Dilşad li ser hespê xwe bi lêze re ber bi Dîlberê ve diçû. Her weha ku çend nêzîkê wê dibû û bi ber bi wê ve diçû dilperiya ku di dilê wî debû, hê bêhtir dibû. Xwîna laşê wî digot qey baz dide serê wî, her weha lê dihat. Bi rewşeke weha re Dilşad û hevalê wî gîhane nêzîkê malên ku navendê . Gava ku gîhane ber navendê êdî hespê xwe hinekî rawestan dan û hêdîke dest bi çûnê kirin. Dilşad hespê xwe hêdîka dimeşand. Hevalên wî jî bi wî re hespên xwe weke wî hêdîka dan meşandin. Gava ku gîhane nêzîki navendê, Dilşad li hevalên xwe meyizand lê çî gotinek bi deng ji nav lêvên wî ne derketin. Bi meyizandina xwe re weke ku bêjê wan hûn li vir li hêviya min birawestin, ta ku ez vegerim. Gava ku Dilşad li hevalên xwe meyizand, êdî li ber navenda wan pa. Ew bi xwe re li ser hespê xwe ber mala bavê Dîlberê ve çû weke heyamekê li ser hespê xwe bi meşîne diçe û bi çûna xwe re ku giha navendê li nig mala bavê Dîlberê, êdî ji hespê xwe peya bû û bi piyade çû. Gava ku her weha Dilşad digehê navendê, ew jî li ser hespê xwe peya dibe û bi piya ber bi mala bavê Dilbare ve riya xwe digire û diçe ku here û wê bibîne.

Dilşad bi wê armancê hati bû ku wê bibîne. Lê ka wê çawa dîti bana? Wê jî li ser vê yekê gava li ser hespê xwe diçû, dihizirî. Ew jî hema wilo bi hespê xwe re tenê ber bi mala wê ve diçû. Her ku diçû, dilperiya dilê wî jî hê bêhtir dibû. Dilşad gava ku dikeve navendê de, hinek mirovên ku wî nas dikirin dibîne. Li nig wan diraweste. Hinekî

bi wan re dirûne û dipeyive. Di wê heyamê de bi hevalên wî re jî gava ku li ser çûna wî re dem diçe û ne divegere, êdî ew meraqan dikin. Ew jî hinekî din jî dimênin û pişt re, bi hev re dihên ber bi navendê ve. Gava dihên û dikevin nav navendê de û ku hinekî jî dimeşin, dibînin ku hin kes û Dilşad li nig hev dirûnin û ji xwe re dipeyivin. Hevalên wî jî gava ku her weha wî dibînin êdî ew jî diçin nig wî û mirovên ku li nig rûniştine. Gava ku diçin, pêşikê li wan slav dikin û pişt re li nig wan dirûnen. Hevalê wan ê mazin li hevalên xwe yê din meyizand û pişt re jî li Dilşad meyizand û karê xwe kir ku rabe. Gava ku li Dilşad meyizand, dît ku hinekî aciz e. Hevalê wan ê mazin hinekî bi jîr bû. Ew ji kurê serekekî bû û gotina bavê jî dihate hesandin. Bi wê kifşkirina xwe re, ew jî dikeve di hiziran de. Mala hinek xizmên wî jî, li wê navendê bûn. Piştî ku hinekî hizirî, li hevalên xwe û li mirovên ku dûrên wan rûniştine meyizand, kar kir destûrê ji wan bixwaze û here. Hevalên wî hinek çavan ku bê kifş lê meyizandin. Lê wan jî tişteke fahm ne kir. Gava ku destûr xwast, gote hevalên xwe jî; 'ez ê behneke din wêrim' û ji wir rabû û bi tenê kete rê û çû. Peyayekî ku li wir rûnişti bû li hevalê wî yê biçûk meyizand û pirsî ku; 'ma hevalê te çû ku derê?' Wî jî ni zanibû. Wî jî li peyayî meyizand û got ku; 'dibit ku here mala xaltîka xwe ya ku mala wê li vir e'. Piştî wê bersivê re êdî deng ji çî kesekî ne derket. Lê di serê hevalên wî de meraqa wî ya ku çûbû ku derê, hebû. Ew jî li nig hevdu rûnişti bûn û ji xwe re dipeyivîn. Dilşad hati bû ku Dîlberê bibîne. Lê mirovê mazin ew girti bû û li nig xwe dabûn rûniştandin. Tişteke ku kiri ba jî her weha wê kêlîkê tune bû. Weke heyamekê li nig hevdu rûniştin û bi hev re dipeyivîn. Piştî heyamekê êdî hevalê wan ên mazin jî hat nig wan û rûnişt weke tişteke ne bûye. Ji ruyê wî dihate xuyakirin ku ew di serê xwe de xwediyê hinek hiziran bû. Lê

çi di serê wî de hebû, wê kêlîkê çi kesekî ni zanibû û fahm ne dikirin. Li bi vê rewşa ku bi wî re bû, hevalên wî ye din jî bi mereqan lê dimeyizandin. Gava ku wî jî li wan dimeyizand, weke ku bi awirên xwe re bêjê wan; rehet bin, li wan dimeyizand. Awira wî zelal bû. Gava ku mirov jî li çavên wî dimeyizandin, ev zelalî didîtin. Her çi ku di serê wî de hebû jî, wê kêlîkê gava ku li çavên wî dihate meyizandin, dihate têgehîştin, ku ji xwe bi bawer bû. Lê ew bawerî çi bû ku di ruyê wî de dihate xwandin, ew yek jî, ji aliyê hevalên wî ve, ne dihate kifşkirin. Her ku çûba, tenê wê kêlîkê di serê wî de bû. Wî tenê zani bû. Dilşad û hevalên xwe demeke dirêj li nig wan mazinên ku ew dane rûniştandin, rûniştî bûn û pişt re ji hev destûr xwastin ku biçin. Piştî heyamekê êdî kar dikin ku rabin. Mazinan jî êdî gava ku destûr dana wan ku rabin û herin. Lê hevalê wan yê mazin gote wan pêşîkê em herin malê xaltîka min. Piştî ku hevalê wan ên mazin ev yek gote wan, êdî wan jî tiştê ne got. Mala xaltîka wî nêzîki malê Axa bû. Peyayê xaltîka wî jî digotinê de Arfan. Ew mirovek zane bû. Axa li ser gelek biryarên xwe bi wî re jî dişewirî. Arfan sêwirmendekî pir baş bû ji Axê re. Navê xaltîka wî ji Delalê bû. Delalê yeka hinekî pîr bû. Zarokên wê mazin bûn. Delalê dayika çar keçan û du kurekan bû. Delalê yeka ku di keçaniya xwe de bi xweşikatiya xwe re bi nav û deng bû. Gelek caran gava ku Dilşad û hevalên xwe li wir mabûn, li mala wê bûn. Hevalên Dilşad û wî dabûn rex hevdu û diçûn mala xaltîka hevalê xwe yê mazin. Weke heyamekê ku rê ve çûn, gîhane mala xaltîka hevalê xwe yê mazin. Gava hatina mala wê bi qadrekî mazin ji aliyê malîvanan ve hatin pêşewazîkirin. Gava dikevîne hundurê de û tene pêşwazîkirin jî êdî pişt re diçin odeya rûniştinê û bi hev re dirûnên. Dayika Delalê jî gava ku ew dirûnên li nig wan dirûne. Her weha weke heyamekê ku

rûniştibû dimînin keça dayika Delalê ya mazin ku navê wê Zînê ye dikeve hundurû de û di guhê dayika xwe de tiştêkî dibêjê. Di nav civatekê de devê xwe dayin ber guhan û tiştgotin rast ne dihate dîtin. Lê ji ber ku hinek gotinên jinan jî hebûn û ne dibû ku hemû kesek pê bihesiyana, ji ber vê yekê dikirin. Piştî ku Zînê di guhê dayika xwe de dipeyvî, êdî dayika Delalê jî li Dilşad meyizand û gotîyê de; 'kurê min de ka bi min re were, em herine derve piçekî'. Piştî ku dayika Delalê weha gotîyê de, dayika Delalê rabû ser xwe di cih de û li hevberê wî rawesta. Dayika Delalê ew da di rex xwe de û çûn devê odeya din, ku devê di heman delanê de çûn li ber devê wê rawestiyan. Dayika Delalê gava ku giha devê derî ew rawesta û gote Dilşadî; 'kurê min here hundurû yek li hêviya te ye di odayê de' Dilşad şaş mabû li ber vê yekê. Ki bû ku li hêviya wî bû di odayê de? Her weha bi hinek awirên ku şaşbûnê li dayika Delalê meyizand û pişt re deste xwe da derî ku weke û bikeve hundurû de.

Dilşad gava ku derî vekir di wê heyamê de hê bêhtir şaş ma ji xwe re. Şaşbûn û dilperiya wî ya ku pê re bû pir mazin bû bû û di nav hevdu de xwe bi ruyê wî re dida derve. Dilşad çawa ku derî vekir bû, Dîlberê li hevberê xwe dîtibû. Gotinêke di nav xelkê de hebû. Ew gotin jî her weha ku dihate gotin, 'sed salî ez hizirîbama min ev yek zen ne dikir.' Bi vê gotinê re mirov her dem şaşbûneke xwe dihanîne ser zimên. Wê kêlîkê bi Dilşad re ji bo vê yekê sehkirinek pê re çê ne bû bû bi hevalê wî re. Lê gava ku Dîlberê li hevberê xwe dîtibû, gelek dilxweş bû bû. Dilê wî wê kêlîkê gelekî rehet bû bû. Dilê wî bi dîtina Dîlberê re bûbû weke perperokekê û sivik bû bû. Weke bêhneke ku li Dîlberê li ser lingan re lê meyizand, êdî pişt re bi gavên biçûk re çû nig wê û li hevberê wê rawesta. Gava ku li hevberê wê rawesta jî, weke bêhneke bêdeng mabû û pişt re

desmalka wê şanî wê dabû. Dîlberê weke ku fihêt bike serê xwe kire ber xwe de û careke din serê xwe ji ber xwe rakir û li ruyê Dilşad meyizand. Pişt re Dilşad û Dîlberê destê xwe dane hevdu û her weha bi hev re çûn û li nig hevdu rûniştin. Car bi car bi gotinên biçûk bi hev re dipeyvîn û car bi car jî bêdeng li hevdu dimeyizandin. Dilşad li Dîlberê meyizand û gotiyê; 'Tu ya dilê min ji bo xwe, ji xwe dizanî ne wilo?' Dîlberê jî bi meyizandineke ku bêjê; herê, re lê meyizand. Dilşad û Dîlberê demeke di odeyê de li nig hevdu bi têne man. Her weha ji xwe re dipeyvîn, li hevdu dimeyizandin û bi hev re dikeniyên û bêdeng li hevdu dimeyizandin. Ya di dilê xwe de ji hev re bi meyz û nîşanokan ji hev re hanîn ser zimên. Demeke xweş buhurandin bi hev re. Dema ji odeyê derkevin bi destê hevdu girtin. Gava ku derdikevin der, bi dayika Delalê re rû bi rû tîn. Dayika Delalê dît ku wan destê hevdu girtiye. Gava ku wê ev yek dît ku wan deste hevdu girtiye, bi hev re bi wê dîtina wê re xemgîniyek di dilê wê de çê bû. Dayika Delalê di wê heyamê de gote wan; 'zarokino gava ku ez li wê dimeyizênim hem dilê min bi wê xweş dibe û hem ji xemgîn dibe, ji ber ku malbetên we bi hev re ne li hev in. Hûn ê di vê rewşê de çi bikin?' Li hevberê ve gotinê dayika Delalê, herdûkan pêşîkê li hevdu meyizandin û paşê Dîlberê bersiva dayika Delalê da û her weha got; 'mêraqa ne ke dayika Delalê hûn ji malê ne. Dibit ku bi hevrebûna me ji wan re wê bibe sedemek ku werine nig hevdu. Ew ji dixwazin ku werin nig hevdu. Ji aliyê din ve jî em bawer na kin ku piştî mîr wê werin hevberê hevdu.' Dayika Delalê gotiyê; 'keça min, ez jî dixwazim ew werin nig hevdu. Ez her dem bi we re me, vê yekê zanibin, hûn zarokên min jî ne.' Piştî wê gotinê dayika Delalê jî Dilşad ji dayika Delalê re weha got: 'dayê me biryar da ku demek em ji vir herin. Em diçin derekî din weke heyamekê û em ê



paşê dîsan vegerin mala xwe. Em ê biçin herêma Silo Axa. Navê kurê wî jî dibêjin Reşîd beg e. Bavê min û apê min bi wî re hev baş û qenc bû û mazin nas dikirin. Lê nuha ew ne mane û kurê wî dibêjin ku ketiye dewsa wî de. Lê kurê wî mirovekî çawa ye ez bêhtir ni zanim. Gerek ew jî ji bavê xwe ne kêmbê. Bavê wî baş û qenc dihate naskirin.’ Piştî vê gotinê Dîlberê û Dilşad karê xwe kirin ku derkevin herin derve. Hevalên wî ji di wê heyamê de hati bûn devê deriyê odeya rûniştinê û li wan dimeyizandin. Gava ku Dilşad û Dîlberê karê xwe kirin ku derkevin ji derve, êdî wan jî karê xwe kirin û bi wan re derketin. Gava ku derketin bi hev re hatin ber hespên xwe ku lê suwar bin. Hespêkî din jî ku mahînek bû hat amadekirin ji bo Dîlberê, da ku lê suwar be. Gava hêsp jê re hat amadekirin, bi hev re li hespên xwe suwar bûn û dane ser rê ku herin. Dilşad û Dîlberê jî li hespên xwe suwar bûn û berê xwe dane devê derî û ber bi pêşeroj û bextên xwe ve herin.

Dilşad û Dîlberê herdûkan jî her yek li hespê xwe suwar bû bûn û keti bûn di rê de. Gava ku amadekariyên xwe kiri bûn û ji wir dest bi derketinê kiri bûn, hevalên Dilşad jî bi wan re hati bûn. Ew jî li ser hespên xwe suwar bû bûn û da bûn pey Dilşad û Dîlberê. Dilşad gava ku li hespê xwe suwarbû bû li Dîlberê meyizandibû. Dîlberê jî bala wê li ser Dilşad bû û di her kêlîkekê de lê dimeyizand. Bala herdûkan jî li ser hevdu bû. Lê dilperî bi wan re hebû û bêhtir bû. Gava ku li ruyên wan dihate meyizandin jî, ev yek pir baş dihate dîtîn. Dilşad ji malê derketi bû xwe gehandi bû Dîlberê. Nuha bi Dîlberê re bû û bi hev re diçûn ku ka wê çi hati ba pêşiya wan di pêşerojê de. Jiyanekê çawa li bendî wan bû ew ji ne xuya bû. Têne tiştê ku di serê herdûyan de jî wê di wê kêlîkê de ji wir çûbana û pişt re careke din vegeyabana mala xwe û bi hev re jiyanê xwe

berdewan kiri bana. Gava ku di wê kêlîkê de li wan dihate meyizandin jî, gelekî dilxweş bûn. Gava ku li wan dihate meyizandin mirov digot qey di wê kêlîkê de Newrozê dijîn, evçend di dilên wan de kêf û şahî hebû. Ma gelo çî asteng li pêşiyê wan mabû ku hê jî derbas bibin? Va ye gîhane hevdu û di rex hevdu de keti bûn ser rê de û diçûn. Bavê Dîlberê çend bi bavê Dilşad re ne lihevhatî jî bû, lê dîsan diviya bû ku mirov bêjê ku ji Dilşad xweş bû. Gava ku di şahiyên de Dilşad dihate wê derê gelek caran hevdu didîtin û li nig hevdu jî dirûniştin. Dilşad jî her weha hez ji apê xwe dikir. Bi vî awayî re mirov dikari bû bêjê ku Dilşad û Dîlberê bêasteng keti bûn ser riya pêşeroja xwe û diçûn.

Dilşad û Dîlberê li ser hespên xwe dabûn rex hevdu û diçûn. Hevalên Dilşad ji bi wan re keti bûn ser rê. Weke heyamekê ku her weha çûn êdî Dilşad li hevalên xwe ziviribû û ji wan re gotîbû; hûn êdî ji vir pê de ne yên. Bila meraqa me jî bi we re ne mîne. Gava ku Dilşad her weha ji wan re got, wan jî li hevdu meyizand û paşê li nav çavên Dilşad û Dîlberê meyizandin. Lê destê wan ji wan ne dibû. Ji ber vê yekê jî gotin Dilşad ku ew ê bi wan re hinekî din jî werin û ew ê paşê vegerin. Dilşad ji vê yekê re ji wan re negot na. Dilşad hêşt ku ew bi wan re hinekî din jî werin. Her weha weke heyameke din jî hevalên wî bi wan re hatin. Piştî heyamekê çûn, Dilşad carekê din li wan ji zivirî û gote wan ‘êdî ji vir ve divêt hûn vegerin, heger hûn bêhtir werin, hûn ê bêhtir dûr Kevin.’ Hevalên wan ê mazin li Dilşad zivirî û gotiyê: ‘meraqa me ne ke, têne hûn bi xêr û ewletî herine cihê ku hûn ê herinê de.’ Êdî hevalên wî li ser xwesteka wî ji wan xatirê xwe xwastin û berê xwe dan malê. Lê gava ku li ruyê hevalên wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku hinekî xemgîn bûn. Hevalên wî goti bûnê; em ê bi wê re werin ta cihê ku hûn ê herinê de. Lê

Dilşad vê yekê gerek ne dîti bû. Goti bû wan hûn vegerine malê. Gava ku hevalên wî berê xwe dane malê û ew bi têne û xemgîn bûn. Gava ku hevalên wî ji wan veqetiya bûn, êdî Dîlberê û Dilşad jî li ser hespên xwe dabûn lezê da ku li wan ne be şev û xwe bi gihînin cihê ku wê herinê de. Çawa hevalên wî ji wan qerehabûn, êdî hespên wan jî keti bûn bezê. Dîlberê suwareka gelekî baş bû. Gelek carên berê li hesp suwar bû bû. Hespê Dîlberê car bi car jî dida pêşiya hespê Dilşad di bezê de. Dilşad gava ku ev yek didît, êdî wî ji zor dida hespê xwe, da ku li pêş be. Gava ku hespên wan dibeziya ew jî car bi car di bin çavan de li hevdu dimeyizandin. Lê car bi car jî gava ku li hevdu dimeyizandin û çav bi çav dihatin rûsorbûnekê re serê xwe dizivirandin ber xwe ve. Hespên wan mahîn bûn û gelekî bi bez bûn. Ji ber vê yekê jî riya ku diçûn, zû diçûn. Her weha bi wê lêz û bezê re xwe digehênin nêzîkê çiyayê Mava. Li çiyê na rawestin û jê dibuhurin. Gava ku diçin, Dîlberê bi hinek çavnên ku ne dixwast nas bike lê dimeyizand. Bêhtir ne dimeyizand ji ber ku li ser hespan bûn û di bezê de bûn.

Dilşad û Dîlberê gava ku ji çiya hinekî buhurîn, di aliyê rastê de li zelaloneka ava ku heyî û li pêşiya wan dima, lê rawestiyan. Di zelalonekê de av ji binê erdê derdiket û hinekî li dûrên xwe bela dibû û êdî ku bela dibû pişt re diçû û hinekî jê wir de jî dibû weke golekê ku av tê de li hev digeha hevdu û ji golê jî dibû weke besteke û diherikî diçû di riya xwe de. Lê di herikandina xwe de û di colçûlika xwe de diherikî, gelek kezî di bin kevirên mazin de pê re çêkiri bû. Lê av gava ji keviran dibuhurt û digeha cihê ku weke keviya colçûlika ku axîn li wan deran weke rengê ku ji zêr bi bêr ji binê çiyê ve diçû. Mirov gava ku li rex dimeyizand digot qey ew der erd e û sinaçî li ser çê bûye, dihate xuyakirin. Her weha cihnên ku bi vî awayî hebûn,

li nêzîkê cihên kezînan jî hebûn. Li wan deran jî baqên ku diqevzin dihatine xuyakirin. Dilşad û Dîlberê hespên xwe li ber wê avê rawestandi bûn û ji hespên xwe peya bû bûn ku hinek av li dest û ruyê xwe bikin, hinekî behna xwe fireh kin. Her weha wilo kirin. Gava ku peya bûn ji hespên xwe û bi avê re hinekî behne xwe jî berdan êdî weke heyamekê jî ji xwe re rûniştin li ber wê avê. Dayika Delalê gava ku ew bi rê kiri bûn, hinek lolîkê şîrkirî û penîr ji di nav de hatî hûrkirin bi hinek xurakên din re ku were xwarin amade kiri bû û bi wan re şandi bû. Wan jî hinek ji wê xwarinê bi hev re xwarin li ber wê ava ku hênikatiyeke xweş dida mirov. Gava ku her weha xwarina xwe jî xwarin, êdî careke din li hespên xwe suwar bûn û ketine ser riya xwe de da ku berî ku li wan bibe şev xwe bigehînine cihê ku wê hernê de. Dilşad gava ku kar kir, ku li hespê xwe suwar bibe, dît ku Dîlberê hat nig hespê xwe ku lê suwar be. Êdî wî jî di wê heyamê de dest xwe ji suwarkirinê berda û çû nig Dîlberê daku alîkariyê bidiyê de, ku ew li ser hespê xwe suwar be. Dîlberê bi alîkarîye wî re li hespê xwe suwar bû. Lê Dîlberê gava ku li hespê xwe suwar bû, hespê xwe ji cihê xwe ne da lebitandin, ta ku Dilşad jî li hespê xwe suwar bû. Gava ku Dilşad jî li hespê xwe suwar bû, êdî hesp dana rex hevdu û ketine rêveçûnê de. Riya wan hê hinek mabû. Lê bêhtir ji ne ma bû. Gelek re hati bûn. Gava ku di riya xwe de hati bûn di ber gelek cihên ku mal lê hebûn. Di riya xwe de li rastî gelek mirovên ku di nav erdên xwe de ku kar dikirin hati bûn. Gava ku digîhane wan mirovan silav didane wan û ji wan dibuhurîn û riya xwe berdewam dikirin. Li ser riya xwe di ber daristaneke ku ji çilo ji pêk dihat, buhurî bûn. Qirşikên çilo ji şewatê re gelekî baş bûn. Ji xeynî wê yekê jî gelek darên behivan û baruyan ji dîtî bûn. Di wê herêmê de darên kuhîjan û tawan jî hinek dihatine dîtî. Lê mirov

bêhtir bi wan deran re pêwendîdar (eleqeder) ne dibûn. Bi bêhtirî li pey dîtina darên tuyan bûn. Darên tuyan jî mirov li ber xetên rez û werzên xwe car bi car diçandin. Gelek mirov xetên erdên xwe bi darên tuyan re kifş dikirin. Darên tuyan ji çandinê re ji gelekî rewa bûn. Darên tuyan her weha darên ku zû mazin dibûn ku dihatine çandin. Lê piranî ji li gelek cihan jî ji ber xwe çêdibûn, ji ber ku ax û saqe jê re gelek rewa bû. Gava ku Dilşad û Dîlberê di riya xwe de diçûn, her weha rastî gelek hebûnan dihatin. Gava ku wan jî her weha li dûrên xwe dimeyizandin, behna wan fireh dibû. Mirovên ji wê heremê gelek malbata Dilşad û Dîlberê nas dikirin. Lê li wan ne dîsankinîn ji ber ku dixwastin ku hinekî hê zûçir xwe bigihînin cihê ku wê herinê de. Her weha kêlik li ser kêlîkê, dem li ser demê dihatin û diçûn. Dilşad û Dîlberê ber bi êvarî re xwe digehênin cihên ku wê herinê de. Gava ku xwe gihandin ber cihê ku wê herinê de û ku hê bêhtir nêzîktîr dibûn, di riya xwe de hê bêhtir rastî mirovên ku diçûn û dihatin û kardikirin dihatin. Cihê ku Dilşad û Dîlberê hati bûnê digotine Azînê û wekî din jî jê re digotinê de Mêrgeberava. Cihekî ku gelekî xweş bû dihate xuyakirin. Çend ku hê bêhtir ku nêzîkê navende dibûn hê bêhtir mirovên ku di ber wan de diçûn û dihatin çêdibû. Gava ku gihabûn ber navendê li ser hespên xwe bûn lê ne bi lez bûn. Çûna wan êdî ne bi lez bû. Êdî gihabûn nêzîkê navendê û di ber wan ve jî mirov dibuhurîn, pir bi bal li wan dimeyizandin. Ji cilên ku li ser wan bûn jî dihate têgehîştin, ku mirovên ku zadegan bûn, dihatine xuyakirin. Gava ku her weha digihen navendê Dilşad jî hinek mirovên ku xwe digihande wan, wan dipirsî mala beg şanî wan bêxin û herinê de. Bi êvarî re xwe digehênin mala Reşîd beg.

Gava ku digihîjin wir gelekî wastahî bûn. Li ser piştta hespan jî bêhtir çûyin, wastandin û êşandina piştê çê dike. Her weha bi wan re jî wastandin û pistêşandin çê bû bû. Gava ku gihabûne mala beg rast û rast çûbûn nig beg. Beg hinekî ji wan pirsî bû ku ji ku derê û çawa û her weha jî ji ber çi hati bûn. Reşîd beg xwe weke begekî dide nîşandan û her weha weke begekî nêzîkî li wan fikir. Lê divêt em bêjin ku hê ne beg bû. Birayekî wî ku ji wî mazintir hebû û mirov bi çavên begîtiyê li wî dimeyizandin. Lê birayê wî yê mazin di wê kêlîkê de ne li malê bû. Reveberiya osmaniyan jê nexweş bû. Ji ber vê yekê jî diçûn ser wî her ku derfet dîti bana. Ji ber wan çûyinan weke dem êke çûbû nig Mîrê Bota ji bo ku ewlekariyê xwe bigre. Lê Reşîd beg ji ber ku li hevberê osmaniyan ne dirabû û li gor hinek gotinên wan bi wan re bi rê ve diçû, bêhtir ne dihatine ser wî de. Ji ber ku car bi car bi osmaniyên re dimeşî, hinek mirovên herêman jî jê nexweş bûn. Lê belê ne diçûn ser wî de di wê heyamê de. Bavê wî gava ku miribû çavên xwe berdabû begîtiyê. Her weha bi rêveberiya osmaniyan re meşîn jî, jê re dibû weke hêzeke ku xwe bide nîşandan. Lê divêt mirov bêjê ku dêna mirovan bi bêhtirî jî, li ser birayê wî yê mazin bû û bi navê xwe weke Mîrzan beg dihate ser zimên. Mîrzan beg ji aliyê bavê xwe ve jî dihate hezkirin. Di nav civakê de gava ku mirov hez ji begê xwe fikir û ku begê wan jî hez ji êkî fikir her weha qedir jê re çê dibû. Mîrzan beg jî ji aliyê mirov ve dihate hezkirin. Gelek caran jî gava ku bavê wî çûbû Cizîra Bota nig Mîrê Bota ew jî bi xwe re biribû. Ji ber vê jî mîr jî wî nas kiri bû. Mir gava ku ew dîti bûn, ji kesayetiya wî bi kêf û bawer bû bû. Her weha gava ku xeterî li ser çê bû bûn ji çûbû xwe li Mîrê Bota girti bû. Ew demek dirêj bû jî li nig mîr dima di wê heyamê de. Ji vê yekê jî Reşîd beg derfet standibû û xwe weke begê mazin yê ku dewsa

bavê xwe bigire dabû nîşandan. Bêguman divêt mirov bêjê ku yê herî bêhtir mazin û baş Mîrzan beg bû û mirov ji xwasteke xwe ji aliyê wî ve dida nîşandan. Mirov ji tiştê ne digotin ji ber ku hûmeta wan ji begê wan yê mazin re hebû. Ji aliyekî din ve jî ew jî kurê wî mirovê ku jê re hûmet dihate girtin bû. Bi vê yekê re jî bêhtir çî deng li hevberê wî ne derdixistin.

Dilşad û Dîlberê herdûkan bi hev re çûbûn odaye mazin ên ku lê dirûniştin û ji xwe re dipeyvîn. Herdûkan jî gava ku li hevberê Reşîd beg rûniştî bûn, li nig hevdu rûniştî bûn. Dîlberê weke kêlîkekê dixwast bi destê Dilşad bigire ji ber ku çawa ku dikevin hundurê de, çavên Reşîd beg çûbûn li ser wê di wê heyamê de. Her weha xwastekek ketibû di dilê wê de di wê heyamê de. Gava ku keti bûn hundurê û rûniştî bûn Reşîd beg jî gava ku Dîlberê dibîne, bi çavên xwe yê ku pir bi bal, lê dimeyizêne. Dîlberê ev yekê kifş dike di wê heyamê de. Gava ku ev yekê kifş kir jî pir acizbûn pê re çêdibe. Lê ji bo ku nede derve jî bi baldariyê tevdigere. Lê çend wisan tevdigere jî dîsan ji rûdana wê ew acizbûna wê ne dida veşartin. Gava ku her weha dîti bûn ku Bala Reşîd beg çûye ser wê, hê bêhtir xwe bi ser Dilşad ve dabûyê de. Car bi car ji serê xwe ji dikire di ber xwe de û her weha li pêşiya xwe dimeyizand. Dilşad û Reşîd beg bi hev re dipeyvîn di wê heyamê de. Dîlberê jî li nig Dilşad rûniştî bû û ji xwe re dihesand. Dilşad ji beg re behsa hatina xwe û hevalê xwe fikir ku çî di rê de dîti bûn û çawa hati bûn ta wir û di herêman de çawa buhurtibûn û hwd, jê re bahs fikir. Dilşad di wê kêlîkê de bêhtir acizbûna Dîlberê fahm ne kiri bû. Ji ber vê yekê jî tevgera xwe asayî berdewam fikir. Her weha ta demeke dirêj li nig hevdu rûniştin û ji xwe re peyvîn. Ta ku rûniştî bûn jî bala Reşîd beg li ser Dîlberê ma bû. Dîlberê keçikeke ku gelekî xweşik bû. Bi meyizandin

û nêzîkatiyên wê yên ku nazikane ne, bala mirov diçû ser wê. Mirov gava ku ew didîtin, li xweşikatiya wê pir bi bal dibûn. Ji aliyekî din ve jî ji aliyê rûdana wê ve gava ku hinarikên wê ji ber dîtinan sor dibûn, bala mirov hê bêhtir dikisşande ser wê gava ku lê dihate meyizandin. Di wê kêlîkê de jî çavên ku li ser Dîlberê bûn, dibûn sedema fihêtbûnekê ku bi wê re xwe dida nîşandan. Lê bi wê re di wê heyamê de bi têne ne fihêtbûn hebû. Bi fihêtbûnê re acizbûn jî her weha xwe ji ruyê wê dida derve, li ber çavan. Dîlberê di wê kêlîkê de xwe digirt. Nehêşt ku ji tevgerên wê tiştek were têgehîştin ji acizbûna wê di wê heyamê de. Reşîd beg fahm kir bû ku ew aciz bû bû. Lê dîsan meyizandina xwe berdewam kiri bû. Di wê heyamê de ne dixwast ku tiştekî bide ber çavan bi tevgerên xwe re. Her weha weke heyamekê gava ku li nig hevdu rûniştin, êdî gava bi ber êvarê re dem hat, Dîlberê û Dilşad jî bi destûrxwastinê re rabûn û çûn odeya ku ji bo wan hati bû amadekirin. Lê Dîlberê piştî ku li nig beg rûniştî bû û çavên beg ên ku li ser wê raq mabûn, dîti bûn, êdî pişt re nerehet bû bû. Dîlberê her weha gava ku bi Dilşad re dabûn rex hevdu û diçûn odeya xwe ve, di wê heyamê de ji ruyê wê dihate têgehîştin, ku ne rehet bû. Her weha bi vê yekê re Dîlberê di serê xwe de dihizirî ji ber ku ev nêzîkatiya beg di serê wê de li mejiyê wê aliqi bû.

Reşîd beg gava ku Dîlberê hati bû li hevberê wî rûniştî bû bi çavên raq re lê meyizandibû. Dîlberê jî ji vê yekê pir aciz bû bû. Wî jî ev yek di wê heyamê de fahmkiri bû. Lê dîsan meyizandina xwe qut ne kiri bû û berdewam kiri bû. Dîlberê bi xweşikatiya xwe re li ser wî gelekî bandureke mazin kiri bû. Bi bandora ku li wî hatî kirin re, li wê dimeyizand. Ji ber vê yekê ji Dîlberê aciz bû bû. Reşîd beg gava ku Dîlberê û Dilşad ji wir çûbûn jî hêji ew di fikaran de bû di wê



heyamê de. Ma gelo çî hizir di serê wî de di wê heyamê de hebû û ev çî bû ku wisan mazin çê bû bû ku ta ku wî evçend dihizirand? Li odaye Reşîd beg gelek mirovên din jî yên ku li nig wî di civata wî de rûniştî bûn, hebûn. Lê di wê kêlîkê de tema wî ji wir û wan inansan ne bû. Di serê xwe de ji wir weke ku çûbû dihate, xuyakirin. Gelekî li ser Dîlberê di serê xwe de dihizirî. Dîlberê û Dilşad bi mehvandarî re hati bûn mala wî di wê kêlîkê de. Li mala wî herdû jî di wê kêlîkê de mêhvanên wî bûn. Mirov gava ku li malekê bû mêhvan dibe weke rûmeta wê malê di wê heyamê de. Her weha nêzîkatî li mêhvandariyê dihate kirin. Mêhvandarî di nav civakê de gelekî bi qadr û qiymet dihate pêşwazîkirin. Nuha jî Dîlberê û Dilşad bi hev re li mala Reşîd beg mêhvan bûn. Reşîd beg ji diviya bû ku mêhvandariya xwe li hevberê wan bidana nîşandan bi nêzîkatiyeke baş û durust. Ji aliyekî dî ve jî diviya bû ku mêhvan ji aliyê nêzîkatiyên xwediye malê û tevgerên wî ve ji aciz ne bûba. Her weha mêhvandarî li ser hinek nêzîkatiyên rêzê re di nav civakê de hebûna xwe ava dike. Reşîd beg di nav mirovên ku li dora wî rûniştî bûn de, ji xwe ve çûbû. Di mejiyê xwe de ne di nav wan mirovên ku li dora wî bûn, de bû. Dîlberê û xweşikatiya wê di serê wî de cihekî ku gelekî mazinbû girti bû. Reşîd beg di serê xwe de weke ku wê çawa bibe xwediye wê xweşikbûne dihizirî. Lê ka ma ev yek mimkun bû? Dîlberê û Dilşad hez ji hevdu dikirin û ya ku ew anibûn wê derê jî ev hezkirina wan bû. Reşîd beg ev yek jî ji nêzîkatiyên wan fahm kiri bû. Lê bêguman gava ku ev yek dîti bû jî hêdî hêdî hati bû dîtin. Gava ku Dilşad û Dîlberê ji nig wî rabû bûn û karkiri bûn ku herin odeya xwe ji paş wan ve jî pir bi bal ve Reşîd beg li Dîlberê meyizand. Dîlberê gava ku di bin çavên xwe ve lê meyizandibû, ev yekê pir mazin û qenc dîti bûn di wê heyamê de. Lê Dîlberê di wê heyamê

de jî tiştekan ne dabû kifşkirin. Her weha weke ku ne dîti bûn li xwe hanîbû û ji wir derketi bû bi Dilşad re. Hebûna Dîlberê her weha di serê Reşîd beg de pir mazin cih girti bû. Piştî ku ew ji wir çûbûn, êdî Reşîd beg pir bêdeng bû bû. Di wê kêlîkê de mirovên ku li dora wî dipeyvîn gelek bûn, lê ta wî ji wan ne bû. Reşîd beg li ser Dîlberê di serê xwe de dihizirî. Her weha weke demeke dirêj di serê xwe de li ser Dîlberê dihizirî. Piştî fikarên xwe re dike serê xwe de ku xwe bike xwediyê Dîlberê. Bi vê yekê re li xwe dihizirî bi wê re. Reşîd beg di wê kêlîkê de ku hê xwe bi yekcarî weke serokekî didît. Ev hizra wî di serê wî de pir diçû û dihat. Dîlberê li gor ku wî di wê kêlîkê de hizir di serê xwe de çêkir, bi yekî re revî bû û hati bû wir li nig wî di wê heyamê de. Loma di serê xwe de hizirên xwe dibirin û dihanîn. Her weha gava ku di serê xwe de weke heyamekê hizirî bû, giha bû hizrekî ku tiştekan hati ba serê Dilşad û wê Dîlberê jî bi tene û ji wî re maba. Ji xwe wan herdûkan jî hevdu ravandibûn û hati bûn wê derê. Reşîd beg her weha çavên xwe berda tunekirina Dilşad bi vê yekê re. Gava ku Dilşad tune kiri bana, êdî wê Dîlberê jî yê wî ba. Ji xwe ku mirov jî ji wî pirsîbana, ma çima ku ew mirov hat tunekirin, wî gotiba ku wî keçik bi darê zorê ravandi bû û çawa ku keçik hati bû, ew jî çû bû ser wan û hati bû tunekirin. Lê Reşîd beg ta wê kêlîkê jî hê jî ni zani bû ku Dilşad û Dîlberê kenig û kurêmên hevdu bûn. Wî hizra xwe li ser ku keçikê ji destê mirovekî ku keçik bi darê zorê ravandi bû, ava kiri bû. Loma biryara xwe dide û dimîne şiyar ta ku dibe êvar ku hemû kes raza bûn.

Dilşad û Dîlberê jî di odeya ku ji wan re hati bû amadekirinê de di rex hevdu de xwe dirêj kiri bûn û razahî bûn. Lê Dîlberê ji ber ku lê nihêrti bû, xew ne ketibû di çavên wê de. Wê li ser cihê xwe di rex Dilşad de xwe dirêj kiri bû lê hê hişyar bû. Reşîd beg jî mabû

hişyar di odaya xwe de. Bi Reşîd beg re dilzûavêtinek (împuls) mazin hebû. Ew jî li odaya ku tê de rûniştî hişyar ma bû ji bo ku tiştê ku dihizirî bi cih bihêne. Li odaye xwe ku tê de mayi rawesta ta ser dana razanê re. Gava ku dem dibuhure û dibe ber nîvê şevê ew ji odayê derdikeve û ber bi odeya ku Dilşad û Dîlberê ve diçe bi dilzûavatina xwe re. Gava ku diçe şûrê xwe jî bi xwe re hildide û diçe bi ber odeya wan ve. Her ku diçe jî, ji xwe re dihizire ku ka wê piştî vê yekê çî bibe. Wî tiştê ku dikir ku wê di dawiya wê de çî bibe fahm ne dikir. Lê pir li wê yekê jî ne dihizirî. Tenê Dîlberê di serê wî de bû. Di ser û dilê Dîlberê de jî Dilşad hebû û di wê kêlîkê de jî Dilşad li nig wê di xewa şêrîn de bû. Lê ta wê ji Reşîd beg tune bû ku bi ber wan ve dihat di wê kêlîkê de. Dilşad di xewê de bû. Dîlberê jî hê şiyar bû lê ew jî gumana ku Reşîd beg di ser wan de dihat qet ne dikir. Yek di xewa şêrîn de bû û ya dî jî li evîna xwe di kêfê de bû û dirêjketî bû. Dîlberê jî ji ber ku bal û meyizandinên Reşîd beg ên kirêt hişê wê çûbû ser vê di wê kêlîkê de loma şiyarbû ma bû. Lê bi bal û meyizandinen Reşîd beg re tirsek jî keti bû di dilê wê de. Ev tirs ku ketibû dilê wê de jî ne hiştibû ku ew razê di wê heyamê de.

Di wê heyamê de Reşîd beg jî şûr di dest de û di hatina xwe de digehê nêzîki odeya ku mêvanê wî tê de dirazan. Gava ku Reşîd beg digehê nêzîki devê deriyê wan, dîsankine ji xwe re li hevberê deriyê wan. Her weha weke bêhneke ji xwe re di cihê xwe de dimîne di ber devê derî de. Piştî ku li devê deriyê wan weke behneke ku dimîne, di ber derî de hinek çavên xwe raq dike li hundurê xênî û li wan dimeyizêne, ku ka ew şiyar in yan jî ne şiyar in. Dihate têgehîştin ku Dilşad ne şiyar bû. Lê Dîlberê şiyar bû. Lê ew ji dirêjketî bû. Bi wî awayî re gava ku li wê dihate meyizandin, mirov digot qey ku ew jî raza ye û di xewê de ye. Reşîd beg gava ku her weha pir baş xwe

amade dike û piştî li meyizandina hundurû re lê wisan tê ku ew herdu jî razahî ne. Ew jî hewlê dide xwe ku bi carekê bikeve hundurû de. Wî dîtina xwe de wisan fahm kiri bû ku Dîlberê jî razahî ye. Lê di rastiyê de Dîlberê şiyar bû di wê kêlîkê de. Di nav cihê xwe de wilo xwe dirêj kiri bû, ku mirov lê dimeyizand, mirov digot qey ew jî di rex Dilşad de razahî ye dihate xuyakirinê. Her weha gava ku Reşîd beg bi xwe bawer dike ku ew herdû jî rezahî ne û ji bo ku bi keve hundurû de ji cegerekî ji dide xwe êdî bi carekê re xwe li derî dixê û dikeve hundurê odayê de. Gava ku Dîlberê jî her weha ketina Reşîd beg ya hundurê xênî dibine, êdî ew jî qîreke dide xwe. Bi qêrîniya wê re Dilşad jî ji xewê dihilcêne di. Dilşad jî li qêrîna wê dirabe ser xwe de ji xewê. Lê gava ku ew jî ji xewê dirabe hê ew nûhatî ser xwe ve Reşîd beg pêşîkê xwe diavajê ser Dilşad bi lezekê re û pê re gems digire. Gava ku Reşîd beg xwe diavaje ser Dilşad de jî hê li devê derî xancera xwe ye ku gelekî tûj e di destê xwe de amade kiri bû, dixê di dilê Dilşad de. Gava ku Reşîd beg xancera xwe dike dilê Dilşad, di cih de jî di dilê wî de xancera xwe dizivirêne. Gava ku xanchera Reşîd beg di dilê Dilşad de dizivire, êdî ew jî ji kal dikeve di wê heyamê de. Dîlberê ji her weha ku vê yekê dibîne, xwe li ser Dilşad xwar dike û digire ber pêşîra xwe. Dimeyzêne Dilşad bêcan e. Paşê ku gava Reşîd beg bi ser Dîlberê de tê, dide xwe û here devê derî. Derdikeve derve ji odayê. Dîlberê gava ku xwe bi lezê digehîne derve û hespekî ku lê suwar bibe digere. Dîlberê gava ku baz dide ji odayê hîç li pey xwe na meyizêne û bi girîbûneke hişk di qirika wê de re baz dide xwe digihêne derve. Gava ku Dîlberê xwe digihêne hespekî êdî di cih de lê suwar dibê û hesp dide bezandinê da ku ji wir zû bi zû dûr bikeve. Dîlberê gava ku li ser hêsp diçû weke ku hê li odayê be û tiştên ku di wê heyamê de dîti bûn ji ber çavên wê re

dibuhurtin, wisan diçû. Her weha ji odayê derketi bû û xwe gihandibû hespekî jî û li hespê suwar bû bû û bi lezê ji wir dûrketibû çûbû. Bi Dilşad re hati bû wir lê bi serê xwe tenê ji wir dûr diket diçû. Çend zû xwe gihandibû derve û li derve bû jî, di wê kêlîkê de weke ku miçiniyek pê re çê bû bû, dihate xuyakirin. Di rê de di wê heyamê de gava ku diçû çend bi çavan xwe dimeyizand ji di çûna xwe de dîsan mirov dikari bû bêjê, ku miçiniyek wê girti bû. Bi vê miçûyê re li ser hespê ku di bin de dibezî û ew lê suwar bû diçû di rê de ji wir dûr diket. Dixwast hema ji wir dûr bikeve û bi lez û bez diçû.

III

Êdî hinekî din jî bi zanebûn û mazin bûbû Mihemed gava ku bi seydayê xwe re ji nig Şêx tê malê. Gotinên wî û mirov li xwe dayin guhdarkirin bi wî re hê mazintir dibe. Lê gava ku ji mala Şêx tê malê weke ku bûbe mirovekî din ji aliyê kesayetiyê ve. Her weha hinek guherandinên mazin pê re didan nîşandan. Di peyivtinan de gotinên wî hê bêhtir li mirov bi bandûr dihatin. Ji aliyê kesayetiyê ve xwe bi mirov re dayin herêkirin jî hê mazintir çêdibe bi wî re. Di çûn û hatina xwe de dîtin û fêrbûnên xwe de ji mirovan re dibêjê bi zimanekî ku gelekî xweş be û bi zanebûn be. Mirov her weha gotinên wî bi jinbûyinên wî re jî, wî hez dike û ji wî fêr dibe. Her weha guherandina mazin bi zanebûnê re xwe bi wî re dida nîşandan. Mihemed bi ger û dîtinên xwe re hizran di serê wî de ji mazin dike. Bi vê mazinbûnê re êdî nêzîkê mirov dibe û mirovan nêzîki xwe dike. Hizra wî ya li ser dunyayê û xwezayê jî, xwe bi wan pêşketinên ku bi wî re dihatine xuyakirin de, hê bêhtir xwe bi temen dikir. Mirov bi jinbûnên xwe re, xwe mazin dike. Ew jî her weha mirovên ku xwe bi jinbûnên xwe re xwe baş û mazintir dikir.

Nêzîkatiyên wî yên li mirov hê bêhtir bi zanebûn xwe dida nîşandan. Di bingeha vê yekê de jî, pêşketinên di zanebûna wî de hebûn. Pêşketinên di zanebûna wî de jî bi ger û dîtînan wî re mazin bûbûn. Di bingeha vê mazinbûnê de jî famhkirina wî jî hebû. Her weha xwe gelekî pêş ve biribû. Ew gera bi seydayê xwe re li nig Şêx ji wî re bûbû bingeha ku zanebûna xwe re di nav mirovan de were ser ziman û herêkirin û her weha weke zanistvanekî were naskirin û nîşandan.

Gava ku Mihemed tê malê êdî mirov dikarê bêjê ku zanistvanek e û êdî di nav mirovan de bi hiş û hizir tê naskirin bû. Bi vî awayî mazinbûn pê re çê bû bû. Piştî ku Mihemed diçe nig Şêx û li nig wî bi gelekî mirovên din ên ku zanistvan bûn û her weha bi yên ku gelekî zane û di nav civakê de weke zanistvanan dihatin naskirin, bi wan re hevdîtin kiri bû, êdî bi wan mirovan re meraqa cihên din jî ji bo dîtina bi wî re mazin çê bû bû. Cizîra Bota her weha mirov dikarê bêjê ku cihekî ji wan ciyan bû di serê wî de. Mirovê weke Melayê Cizîrî jî ku di wê demê de dijiyan û li wê herêmê bûn jî di mereqa wî de bûn. Bi zanebûna mirov her weha navê wan jî pir derketi bû û dihate naskirin. Dîtina wan mirovan jî dibû meraqeka di dil û serê mirovî de. Mihemed jî her weha xwediyê mereqeke bi zanebûnê re bû. Navên mirovên ku zane bûn û bi zanebûna wan re navê wan mazin dibe û te naskirin. Zanebûn her weha bi naskirinê re dibe teybetmendiyek ji mirovên zanistvan re di naskirina wan de. Mihemed jî gava ku çûbû nig Şêx çawa ku gelekî mirov naskiri bû û hizrên wan fêr bû bû, her weha ew jî hati bû naskirin û hizra wî jî hati bû zanîn. Mihemed li gelek mirovên zane hisadibû û xwe li wan jî dabû hesandin. Ji aliyekî din ve jî yekê bi zanebûna xwe re hati bû naskirin. Di nav civatê de rûniştin her weha ji bo ku mirov bi hizir û

raman were naskirin, derfeteke mazin dide mirov. Di nav civatê de rûniştin û mafê axiftinê jî hildan û axiftin jî tiştêkî ku gelekî mazin bû, ku divêt her weha werînin ser zimên. Hizrên mirovên zanistvan an jî yên xelkê bi civatên dihate naskirin û bi lêvkin.

Mihemed ji aliyê jîrbûnê ve xwe pêş xisti bû. Mirovekî zanistvan bû welê lê dimeyizandin. Bi vî awayî dihate naskirin di nav xelkê de. Piştî ku ji nig Şêxê xwe vegeriya, di nav mirovan de xwe dida têgehîştinê. Her weha piştî perwerdeya ku li nig seydayê xwe hildayî, mirovê ku xwe gihandibû radeyeke mazin jê derketi bû. Di nav xwandinê de çûyin bi dîtî û xwandina li nig zanistvanan çêdibû. Li nig mirovan her weha ku mayin bi hizir û ramanên wan re xwe mazinkirin diviya. Ji ber vê yekê jî diviya ku ew xwe bigehêne nav wan ku mirovên bi zanebûna xwe re mazin bûne di nav wan de xwandina xwe berdewam kiri ba. Vê yekê jî bi mejî kirin hebûnek jê re diviya. Mihemed gava ku çûbû nig Şêx li gelek cihan geriya bû û bi gelek mirovên ku bi zanebûnê re mazin bûn, bi wan re rûniştî bû û bi wan re dan û standinan kiri bû. Bi vê yekê re li ser gelek herêman û hizran agehiya wî çê bû bû. Bi vê yekê re jî derfetên wî çê bûbûn ku ji bo xwandinê xwe bigehêne hê gelek pirtûkên zanistvanên mazin, ku li ser jîrbûn û pêşketina ku hati bûn nivisandin. Di nav wan pirtûkan û hizran de jî radeya ku heyî, li hev girtin jî bi wî re çêdibû, ku ma kîjan hizir çî dibêjê û kîjan hizir ji kîjan hizirî mazintir e rûberkirin dihat kirin. Ji bo vê yekê jî hinek pêşketin jî di aliyê hizir de diviya bû ku da ku kari ba bike. Ew pêşketin û rade jî bi wî re çê bû bû. Her weha li ser tiştên ku ferbû bûn jî hizra xwe hanîna ser ziman ji girîng bû. Wî gava ku dixwand û fahm dikir, ji hizra xwe li ser wan hizran di nav xelkê de dihanî ser zimên. Bi vî

awayî zanebûna xwe dikire xwediyê wateyê mazin di nav xelkê de.

Mihemed gava ku divegeriya malê, êdî weke ku demeke xwe hem ji aliyê xwandinê ve be û hem jî weke ku ji aliyê kesayetiyê ve be gihandibe dihate dîtin. Di rastiyê de jî divêt ku mirov bêjê di wê kêlîkê de di rewşeke nû de bû di jiyana xwe de. Êdî bêhtir diçû nav civatan de û ji mirovan re di nav wan de dipeyvî bi mejî û hizir re û bi hizir û ramena xwe re. Piştî ku ji mala Şêx vegeriya bû êdî weke ku ketibe taqîkirina radeyekê û jê bi serfirazî temam bûbe dihate xuyakirin. Bi vî awayî weke ku ketibe demeke nû de dihate xuyakirin di jiyane xwe de. Di rastiyê de jî her weha weke ku nêzîkatî lê bêt kirin dihate dîtin ji aliyê xelkê ve. Gav avêtin û hizra xwe hanîna ser ziman êdî ji bo wî weke radeyekê dihate xuyakirin. Ev yek ji dide xuyakirin ku hem ji aliyê hizir be û hem jî ji aliyê kesayetiyê be, ketina wî ya di nav demeke nû têne ser zimên. Nêzîkatiyên wî her weha di wê demê de bi taybetmendiyan wî yên zanebûnê re û bi taybetmendiyan wî yên kesayetiyê re dihatine şirovekirin. Ev yek jî taybetmendiyan kesane zanîna pê re dihenin ser ziman. Hizir bi dîtinê re pêş dikeve. Her weha gava ku mirov girîngdayina xwezayê ya ku bi nêzîkatiyan wî re têt ser ziman şirove dike, mirov dibine ku xweza bi wî re weke hizrekî jî wate distêne. Xweza di serê wî de gava ku xwe bi wate kir êdî mirov dikarê bêjê ku hizra xwezayê bi mirov re wateye pêşketinê çê dike. Her weha wateya pêşketinê jî hebûn û pêşketina hizir bi xwe re têne ser zimên. Hizir di jiyane de xwediyê hebûnekê ye. Ev yek jî bi hizirandinê têt ser zimên. Di nêzîkatiyan Mihemed de jî her weha divêt mirov hinek şiroveyên bi hizira jiyana wî re bike. Hizirandin hinek nêzîkatiyan divêt ji bo ku karibe pêş bikeve bi mirov re. Bi vî yekê re jî mirov dikarê bêjê ku



bi mirov re nêzîkatiyên bi taybetî hene. Li jiyana mirov meyizandin ji aliyê hizir ve hinek azmûnan dide ji mirov re. Mihemed bi nêzîkatiyên xwe re mirov dide hizirandin. Ew bi xwe re mazin jî dihizirî. Ji ber vê yekê jî xwastina wî ya dîtina herêman derdikete pêş bi wî re. Gava ku çû bû nig mala şêx li wê heremê jî bi seydayê xwe re li gelek ciyan geriya bû. Gava vegeriya bû malê jî ev xwastina wî hê bêhtir pêş keti bû. Ji aliyekî dî ve jî gava ku hati bû malê, ev xwasteke ku di dilê wî de bû, hêdî hêdî bi wî re dibû weke xwastekeke ku bi cih bihaniya pê re bi wate dibû. Naskirin û xwastin, dîtin di bingeha hizra wî de di serê wî de ava dibû. Dîtin mirov serwer dike. Ta wê demê bi dîtinan ji xwe re di kesayetiya xwe de serweriyeke mazin çê kiri bû. Bi vê yekê re jî hê bêhtir dixwast ji bo dîtina herêman here wan deran û bibîne ka çawa ne. Mirov ni karê bi wî taybetmendiye tenê çûna xwe şirove bike. Ji ber ku xwastina xwe gihandina zanebûnê jî di serê wî de hebû.

Mihemed piştî ku ji nig Şêx divegeriya malê, hinekî dî li malê dimîne û pişt re karê xwe dike ku here herêman bigere. Hinekî li wan herêmên dûrên xwe digere. Pişt re xwe digihêne biryarekê de. Ew biryara wî jî çûna Cizîra Bota ye. Cizîra Bota di wê demê de bi zanebûn û zanistvanên ku tê de ne deng dabû. Mirov ji gelek herêmên ku derfetên wan bû hebû, xwe digihandinê. Cizîra Bota ji aliyê zanist û zanebûnê ve li Kurdistanê her weha weke navendekê bû. Zanistvanên diçûn wir daku xwe bigihenin zanebûnê jî her weha yê ku li wir in. Mirov ku diçûn wir de, ji aliyê pirtêkan ve be yan jî ji aliyê xwe gihandina zanistvanan jî be, derfet ji wan re çêdibûn. Mirovên zanistvan piranî jî li wir li hev digihan. Yan jî mirov dikarê bêjê ku li wir xwe hinekî din bi zanebûn û zanist re pêşdixistin û mazin dikirin. Ji van aliyan ve derfet çêdibûn. Mirov li wir xwe

digehandin zanistvanan. Mihemed jî gava ku çûbû nig Şêx, bi gelek mirovên ku çûbûn Cizîra Bota re hevdîtin pêk hanî bû. Ji gotinên wan jî gelek tişt der heqê Cizîra Bota de ji fêr bû bû. Di serê wî de jî wêneyekî Cizîra Bota ji çê bû bû. Gava ku hati bû malê jî li ser wê wêneya ku di serê wî de bû pir dihizirî. Bêhtir li mala ne dima û biryara xwe da ji bo ku here Cizîra Bota. Di serê wî de Cizîra Bota xwediyê wateyeke gelekî mazin bû. Gava navê Cizîra Bota tê ser zimên weke navê dibistanekê jî were ser zimên e.

Mihemed piştî ku ji nig Şêx hat malê bêhtir li malê ne dima û dikari bû hema bikeve ser rê û here Cizîra Bota. Gava ku amadekariyên xwe dike û yê ku xatir ji wan bixwaze xatir dixwaze û dikeve ser rê, da ku here Cizîra Bota. Her weha piştî dema xwe ye ciwantiyê dikeve rê de. Ew ta dema xwe ya ciwantiyê, demên xwe bi xwandinê re dibuhurîne. Di wan demên xwe de jî bi gelek mirovên zane re jî tê nig hevdu. Ji xeynî vê yekê jî, bi gelek mirovan re dirûne û dipeyive. Mirovên ku bi wan re dirûnin jî, mirovên zane bûn. Hizir û ramanên wan fêr dibe û ya xwe jî bi wan re dide têgehîştindan. Vê yekê jî di navbera wî û mirovan de dibe bingeha nasbûnekê ji bo wî di wê demê de. Gava ku ji malê derdikeve bi nasbûneke ku pê te naskirin û baş tê naskirin derdikeve. Gava ji malê derdikeve jî êdî dibê mirovekî ku ji nav xelkê. Mihemed gava ku ji malê derdikeve dikeve nav xelkê de, xelkên êdî wî nas dikin û navê wî baş û qenc fêr dibin. Bêguman navê wî yê di nav xelkê de têt naskirin jî navê Feqiyê Teyran e. Feqiyê Teyran her weha navê zanistvanekî ye. Ew zanistvan jî ew e. Mirov gava ku wî dibînin, axiftinên wî hez dikin û her weha nêzîkatiyên wî jî dibinen, ew di çavên wan de dibe Feqiyê Teyran. Mihemed gava ku ji malê derdikeve, berê xwe dide Cizîra Bota. Lê gava ku diçe jî li gelek cihan

jî dirawêste û li wan deran bi xelkê re dimîne. Gava ku diçe nav wan, dikeve nav civatên wan de û bi wan re dipeyive. Mirov gava ku li wî dihesênin, hizrên wî fêr dibûn. Bi hizirfêrbûnê re wî jî nas dikin. Mihemed di nav mirovan de her weha gelekî hat naskirin. Her herêmên ku diçiyê de jî, tê de dimîne û bi mirovan re dimîne û xwe bi wan re dide naskirin. Mirov bi wî re hizra wî jî nas dikirin û fêr dibûn. Naskirin jî wî êdî mazin dike. Bi mazinbûnê re jî di serê mirov de dibe xwediyê rêzeke ku wî weke zanistvanekî dide nîşandan. Di rastiye de jî êdî ew zanistvanek bû û zanistvanekî xelkê xwe bû. Xelkê êdî ew di nav xwe de nas dikir û didît. Mihemed êdî ku ji malê derketi bû, bûbû mirovê xelkê. Xelkê li hizirê wî dihesand û rêz didanê. Ew jî bi hizir û ramana xwe re, ji xwe mirovekî mazin bû. Mirovekî mazin dihizirî. Hizra dema xwe baş û mazin girti bû. Hizra dema xwe baş û qenc fahm dike û di nav xelkê de dihêne ser zimên. Gava ku mirov wî şirove dike, mirov dibîne ku ji gelek aliyan ve taybetmendiye zanebûnê pê re pêşketi bûn. Wan taybetmendiye wî gava ku mirov li wî dimeyizand jî mirov hema didît.

Zanîna bi taybetmendiye xwezayê re hanîna ser ziman bi wî re mazin bû. Hizra xwe bi vê yekê re li nêzîkatiye xwezayî ava dikir û dihanî ser zimên. Li gor wî zimanê xwezayê heye. Gava ku mirov li xwezayê dimeyizêne, ne gengaz e, ku mirov vê yekê ne bîne. Gava ku mirov dît jî bi mirov re pêşketin çêdibe. Lê li gor wî ji bo ku mirov kari ba bibîne jî divêt ji dil mirov zanibe. Lê meyizêne da ku mirov bibîne û fahm bike. Ji vî aliye ve jî li gor wî hinek taybetmendiye teybet hene. Bi dil meyizandin teybetmendiye ji wan taybetmendiyan e, ku divêt mirov nas bike. Dil ji mirov re çavekî ye, ku pê li dunyayê meyizêne. Lê bêguman mejiyê wî jî riyekê ye ji bo

ku li dunyayê bêt meyizandin. Gava ku di bingeha wan nêzîkatiyan de nêzîkatiyên xwezayî hebûn, wî çaxî mirov dikarê bêjê ku wê rastiye nêzîk bikin. Rastî li gor Mihemed rasteqînî (heqîqet) ye. Rasteqînî jî bi mirovan re ye. Rasteqîniya mirov hebûna hizra Xwuda mazin dike. Vê hebûna rasteqînî ji bo ku mirov xwe bigehêne rasteqîniyên din, divêt ku mirov weke ku pêpelokekê bibîne, ji bo ku mirov bilind bibe di zanebûnê de. Her weha yek bi ya din re tê. Bi vê yekê re rastiya jiyane mirov dikarê baş bibîne. Jiyan li gor wî xwediyê dendikeke bingehînî ye. Ev dendikê bingehînî jî, ji hêza xwe çêdibe. Hêz ji çend mirovên bi fahmbûn û zanebûn bûn êdî wê di xwe de mazin bi be û wê xwe mazin bike û têgehîştin cebike. Gava ku têgehîştin çêdibû. Mirov dikare bêje ku bi têgehîştin û rastiye re xwe gihandine rasteqîniyê çê dibe û mazin çê dibe.

Mihemed bi wan hizir û ramanan re dikeve rê de û dike ku here Cizîra Bota. Ew zanistvanekî ku di riya rastiye de bû. Gava ku di rê de diçû jî, ji xwe re dihizirî. Hizira wî di serê wî de ew dibire cihên dûr. Gava ku ketibû rê, tenê bi xwe re hinek pirtûkên xwe kiri bûn di tûrika xwe de û bi xwe re hildabûn. Ji xeynê vê yekê jî hinek nivîsên ku wî nivîsîbûn pê re hebûn. Ji van pê ve tiştek din bi xwe re ne hildabû û ne biribû. Gava ku diçû di rê de cih bi cih lê radiwesta û li pirtûkên bi xwe re hildabûn, li wan dimeyizand. Di nav pirêzên giya de rûniştin û ketina fikaran û xwandin wî rehet dikir. Wî hez ji nav pirêzan û li nav giya rûniştinê dest bi hizirê dikir. Wî gelekî jî vê yekê dikir. Gava ku wî ev yek dikir, bi xwezayê re weke ku bibe yek lê dihat. Di nav pirêzan de rûniştin û hizirandin û li ber bestên avan rawestan û hêlbest û qesîde gotin jî, şahiya dilê wî dihanî. Bestên avê gava ku mirov li ber dirûne, hênikayiyeye pir mazin dide mirov di wê kêlîkê de. Gava ku tav jî hinekî germ dibe û li ber siyekê

rûniştin jî bû, wî çaxî hênikatiya ku hebû xwe dide dilê nav mirov. Hênikatiya ku xwe dide nav dilê mirov jî rehetiyake baş û mazin dide mirov di wê heyamê de. Av di wê heyamê de germahî hinekî kêr dibe Lê na şikêne. Bi vê yekê re hênikatî çêdibe û bi mirov re rehetiyak ji tê ser pê. Di rewşên weha de hizirandin jî baş dibe. Mirov di wan deman de hê bêhtir di xweza de kûr dibe di serê xwe de. Ew hêsaniya ku ji hênikatiyê tê di wê heyamê de di serê mirov de dibe bingeha hizirbûneke ku mirov pir bi kêf dibe di wê rewşê de. Mihemed ji ber vê yekê bû ku ku digeha beravan dirûnişt û dihizirî ji xwe re. Mihemed gelekî hez ji xwezayê dikir. Ji ber vê yekê bû ku gava ku li beravan an jî her weha li nav pirêzên giyê dirûnişt gelekî bi kêf dibû. Bi vê yekê re jî xwe dida hizirandinê di wan deman de. Kêfa wî dihat ku di nav xwezayê de her weha bimîne û bihizire. Gava ku ji malê derketi bû bi dana çol û beyaran re ketibû ser rê de. Gava ku di rê de diçû ji her herêma ku digihayê de jî pir bi bal lê dimeyizand û paşê dibuhurt diçû. Gava ku jê dibuhurt jî, weke ku axînek ketiba di dilê wî de lê dihat. Divêt mirov bêjê ku her weha dîtî di bingeha hizirbûna wî û xwezabûna wî de cihekî mazin ji digirt. Hizra xweza ku di nav hizrekî de hat ser zimanê wî, hizir jî bi xwe re xweza dibe. Bi vê yekê re jî li xwezayê hizirbûn mazin çêdibe. Gava ku li xweza hizirbûn ji çê bû êdî mirov dikarê bêje ku pêşketin di dîtine de û di hizir de xwe dide nîşandan. Her weha bi Mihemed re jî pêşketin mazin çê bû bû. Hizra xwe bi xwezayê re pêşxisti bû. Bi vê yekê re divêt mirov bêjê gava ku di riya xwe de diçû jî, li ber avên bestan dirawestiya ji xwe re û dimeyizand û dihizirî li ser xwezayê.

Di rewşeke her weha de Mihemed rastî Dîlberê dilbirîndar tê. Mihemed gava ku hinekî di weste û digehê ava bestekê û li ber

dirûne, da ku hinekî xwe rehet bike, di wê heyamê de hezî dengê wê dike. Gava ku dirûne hinek nanê ku di di turikê wî de ye derdixe û dest bi xwarinê dike. Pê re dengê xişxişek tê guhên wî ji cihê ku lê rûniştibû hinekî jê wir de. Gava ku xişxiş tê wî ew ji dide xwe û bi ber cihê ku xişxiş jê te ve dimeyizêne. Gava ku dimeyizêne weke mirovekî ku li wir heye li ber ber çavên wî dikeve. Ew jî gava ku baş dimeyizêne, fahm dike û bi rastî ji ew mirovek e ku jê wir de rawestayê, li hevberê wî û di nav çiqilan de lê dimeyizêne. Mihemed baş dibîne ku ew jî bi ber wir ve diçe da ku here bibîne û bimeyizêne ka ma kî ye yan jî çi kesek e ku li wir e.

Gava ku baş dimeyizêne û fahm dike ku miroveke êdî weke ku di dilê wî de jî rehetiyek çê dibe. Bi têgehîştina wî ya her weha re, ku dît ku ew xişxiş ji çi tê êdî ew ji rehet dibe û hem jî hinekî mereqa mazin dikeve di dilê wî de di wê heyamê de. Gava ku fahm dike ku xişxiş ji mirov ji hatîye acêb jî dimîne di cihê xwe de. Ma gelo ew kî ye û çi karê wî li serê vî çiyayê heye? Hem ji bi têne ye. Mihemed gava ku kifş kir, êdî ber bi wê ve çû da ku lê meyizêne ka ma kî ye. Gava ku diçe dimeyizêne dibîne ku wa jinek e li serê wî çiyaye bi têne ye. Mihemed gava ku dît ku wa jin e êdî hê bêhtir şaş û mat ma. Gava ku ew di bi çavên xwe de li jinê hema wilo di cihê xwe de meyizand. Cilên wê tev qetiya bûn. Çi pêlav an ji çarox di lingên wê de ne bûn. Pêxwas bû. Ji lingên wê dihate kifşkirin ku li kaviran ketibû û xûn jê dihat. Binê pahniyên wê gava lê wan dihate meyizandin ji pêxwasbûnê çermê stûr avatibûn. Lê pahniyên wê hati bûn dirandin ji ber pêxwasbûnê. Rû û destên wê gelekî qirêj bûn. Cilên ser jî tev qetandî. Pora wê jî tevlihev bûbû gijilokek. Gava ku li porên wê dihate meyizandin dihate têgehîştin ku ji nav daran çûye, li daran hatîye qelibandin. Ji dûr ve jî gava ku li porê wê dihate

mevizandin, dihate têgehîştin ku weke ku hêjên biçûkçik jî hebûn di nav pora wê de û pora wê bi wan re weke kaşokan dihate xuyakirin. Di cilên wê de jî cihên aliqandinên daran xuya bû. Bi kinc û kirasê wê ve ew tenihênin ku hebûn, hati bûn ferîşandin û bi wê ferîşandinê re tayên dirêj çê bû bûn pê ve. Bi wan tayan re jî pîjên daran lê aliqî bûn. Pora wê jî li pêşiya wê ve jî ser rûye wê girti bû. Di nav biskên pora xwe re li pêşiyê gava ku serê xwe dihilda dimevizand. Kirasê wê li pêşiya wê gelekî qatiya bû. Gava ku her weha li pêşiya wê ve lê dihate mevizandin, dihate dîtin ku navika wê di cihên qatandî de dihate xuyakirin. Li destên wê jî gava ku dihate mevizandin bi neynokên wê ve xûna ku berê jê hati bû û li ser zûwa bûbû. Gûzekên serdestên wê jî weke yên lingên wê di ser de hati bûn û çermê wê li dûrên gûzekan gihabû hevdu. Çengên wê jî ji milikên wê yên qatahî ve derketi bûn derve û dihatine xuyakirin. Çavên wê jî hinekî ji dûr ve gava ku li wan dihate mevizandin, dihate dîtin ku hinekî mazin bûn. Lê divêt mirov bêjê ku çavên wê di rastiye de bêhtir ne mazin bûn. Lê ne biçûk jî bûn. Sorbûna li dora çavên wê dihatine xuyakirin. Ji çavên wê weke ku kil kiri be û kilê çavên wê bi hestiran re herikî be xwarê, dihate xuyakirin. Her weha weke qeytanokên lêwîçinê dihatine xuyakirin. Bi vî awayî weke ku giriya be û hestirên wê çawa ku bi di rûye wê de herikî bin û gihabin hinarikên wê û di cihê ku tê re hatîba jî dihate xuyakirin. Di wê heyamê de gava ku li çavan wê dihate mevizandin mirov digot qey wext e wê bigirî. Xetên ruyên wê kifşkirinên xwe bi lêwîtandinê re xwe stûr kiri bûn. Di kirasê wê de di derên qatahî de gava li laşê wê dihate mevizandin, dihate dîtin ku laşê wê gelekî sipî bû. Lê gava ku lê dihate mevizandin, dihate dîtin ku sipîtiya laşê wê di binê lewitandinê de hati bû veşartin. Pora wê ya dirêj gelekî lewitî bû.

Bûbû weke biskên qarmicokî. Lê gava ku li wan biskên wê jî dihate meyizandin, dihate dîtin ku hingê li darêan aliqî bûn bi wan biskan re çê bû bû, ku gelekî gijlonek bûbûn. Biskên wê weke biskên pezan dirêj û weke hiriyê li ser pişta mihên lihev gelijî bû. Li paqên wê jî cihê ku bi keviran re hati bûn xisandin û bi xisiandinê re birîn bûbûn. Pişt re rehetbûyin dihate xuyakirin. Li gelek cihên ku li paqên wê jî weke qamûskên birînan dihatine xuyakirin. Li argûşka wê ya çepê jî weke pizrikeke dihate xuyakirin lê ne pirzik bû. Her weha dihate têgehîştin ku ew derê wê ketibû ser kevirên ku li ser wan zugûr hebûn. Her weha dihate têgehîştin ku ew demeke dirêj ku di jiyaneke dijwar de ma bû.

Hê bi gelek aliyên din re jî Mihemed gava ku ew dît gotina ku pêşî ji devê wê derketi bû 'aaaxx ma ka ez dibejim' bûbû. Pişt re 'kê te hanî vî rewşê Xwudê ji wan re ne hêle!' Goti bû. Pişt re Mihemed di cihê xwe de bêdeng ma û hema wilo li Dîlberê meyizend. Dîlberê hema wilo di cihê xwe de bêdeng ma bû. Pişt wê li kevirê bû. Li ber kevir gava ku Mihemed hati bû nig wê, weke ku bitirse, xwe li ser çokên xwe lihev kiri bû kom û xwe dabû rûniştandin. Lê ji cilên wê çend qatahî jî bûn, dihate têgehîştin ku yeka keça begekî yan jî axayekî bû. Mihemed weke heyamekê gava ku ew dîti bû, li hevberê wê bêdeng di cihê xwe de ma bû. Piştî heyamekê di cihê xwe de êdî ji wê pirsî bû. Lê di serî de Dîlberê bersiva wî ne dabûyê de. Her weha serê xwe kiri bû di ber xwe de û kelegirî lê dimeyizand. Dibit ku jî kar kiri bû ku bipeyive lê bêjêyên wê di qirika wê de aliqî ma bûn. Dibit ku dixwast di wê heyamê de ji wî re tiştêk bêje, lê weke ku tiştêkî di serê wê de ew dabû kilîtkirin. Ma gelo ew mirovê ku di wê kêlîkê de li wê rewşa wê dimeyizand û tiştêk jî, ji rewşa wê fahm ne kiri be, wê çend ji bêjêyên ku ji devên wê derketiba wê fahm kiri



bana? Mihemed tenê di cihê xwe de mabû û li wê dimeyizand. Dibit ku wî jî dixwast tişteki jê re bibêjê di wê heyamê de. Lê ka ma wî ku tişteke gotiba wê çi bigota? Her weha dîtinê de pirs li pey pirsê dikete serî de. Di wê rewşê de jî weke ku bersiva her pirsê hebû. Lê dil ne ra digirt, ku bihêne ser zimên. Lêvên di wê heyamê de li hev dihatine kilîtkirin. Mirov ku li wê rewşê dimeyizand, bi hebûna xwe re li hevberê wê rewşê şapole dibûn. Mejiyê mirov didît bi wê rewşê re rapêrinê dikir. dixwast gotina herî mazin ji bo wê rewşê ku didît bihêne ser zimên. Lê her gotina ku di hundurê xwe de weke ku mazin bû, didît jî gava ku dihat ser zimên biçûk dima. Bêjeyên ku ji bo wê rewşê ji bi riya lêvan re dihatine ser zimên jî weke ku biqeribin dihatine ser zimên. Bêjeyên di nav Lêvan de gava ku dihatine ser lêvan weke ku bixwazin careke din vegeriyan meji di nav lêvan de dengê xwe kêmbûnê dikirin. Bi dengê kêmbûnê re di qirikê de dibûn qurpînek û diman. Zimanên mirov bi wê qurpînê re diqulapt bi ser xwe de. Weke ku zimankê biçûk bibe deriyek di hundurê dev de û ji bêjeyan re ku derkevin derve, parezbûneke çêdikir, da ku dernekevin derve di wê heyamê de. Bêjeyên her weha di dev de, ji xwe re di piştî zimankê biçûk de jî xwe re kozikek çêdikirin ji bo ku ne binin nav ji wê rewşê re. Di wê kêlîkê de weke ku saqeyekê ku gelekî nigidî be û li bixe, li mirov dihat. Laşê mirov li ber dîtina wê rewşê ta digirt û gizlonek bi laşê de dihatine xwarê. Hizir weke ku di de qeşa bigre lê dihat. Hizir li hevberê wê rewşê dibû qalibek kasa di serî de. zor dida xwe ku gotinêke bêjê ji bo wê rewşê ku dihat dîtin di wê heyamê de. Lê her gotina ku di de ji bo gotina li ser wê rewşa ku dihat çêkirin jî, weke ku bayê fercê lêxe dima di cihê xwe de, di serî de, di de. Çi gotin hebûna xwe ji bo ku wê rewşa ku dihat ber çavan bihêne ser ziman têr ne didît. Her

lefza ku weke dengeki çêdikir û dihanî ser ziman jî, weke ku ne dixwast di hundurê xwe de çi têne ser ziman kifş bike wilo li mirov dihat. Gotin bedengî li hevberê wê rewşê ji xwe re dixwast. Weke ku di serî de bitavize, bêgotin dima di wê heyamê de. Ewan gotinên ku di serî de di de çêdibûn ku bûban gurzek û li çiyayan hati ban xistin wê çiya jî çiyayiyê kiri bana. Lê li hevberê wê rewşa xwe di hundurê de di sinçisandin û di de dihiştin. jî ji çêkirin û negotina bêjêyan betal bû bû. Weke ku dixwast di hundurê xwe de her weha bêsinor bêjêyan çê bike bi dimenan raxe li ber çavan. Lê her bêjêyê ku di de dihate çêkirin jî, li hevberê wê rewşê bêserî dima û diçû û dihat di di serî de. Dibit ku rapêrina jî ev bû ku çêdibû her weha li hevberê wê rewşê ku di serî de. Rapêrina rapêrina mirov e. Rapêrina mirov jî her weha li hevberê rewşên wîsa xwe dide nîşandan. Li hevberê Dîlberê, Mihemed bêdeng mabû. Her weha di serê wî de jî jixweçûyin bûbû bi wî re li hevberê wê dîmena ku didît. Di serî de xwastibû ku hinek gotinan bêjê, lê gotinên wî di nav lêvên wî de aliqi mabûn û ji devê wî ne derketi bûn. Mihemed bi çavan weke ku hêsir jê werin xwarê, li Dîlberê dimeyizand. Di wê heyamê de piştî dîtin û meyizandinê, gotina ku ji devê wê derketi bû 'aaaxx ma ev çi bext e ku ez hanîm vê rewşê. Çi baxtekî bêbext!' Pişt re Mihemed ji cihê xwe lebitî û ber bi wê ve çû ku pê re bipeyive.

Lê gelo ew ê bipeyiviya? Yan jî wê çawa bipeyivîya? Ew jî di serê xwe de di wê kêlîkê de weke dihate dîtin di bêkifşbûnekê de bû. Dîlberê di rewşeke wilo de li ber çavên wî bû ku hewl daba xwe ku bipeyive wê bêjêyên wî ji devê wî revin çûbana ji bo ku wê rewşa ku dihate dîtin na hênin ser zimên. Bêjêyên bi wî re di rapêrinê de bûn. Mihemed gava ku ber bi Dîlberê ve bû weke ku dîtina bêkal mabû, lê hati bû. Gava ku çû nig Dîlberê jî li ber wê li hêla rastê li

ser çokên xwe rûnişt û bêdeng ma li nig wê. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, mirov digot qey wext e wê gotin ji devê wî derkeve ji bo ku bipeyive. Lê bêdeng bû. Bi bêdengiyêke wilo bû ku gelekî bi êşê re di cihê xwe de dima. Mihemed carekê dida xwe ku hewl bide pê re bipeyive. Lê jê re zahmet dihat ku bipeyive. Lê dîsan da xwe ku bipeyive. Li cihê Dîlberê hinekî dida xwe ku xwe bizivirêne da ku berê xwe bi yekcarî bide wê di wê heyamê de. Mihemed gava ku berê xwe dayê de pêşî xwast ku destê wê bigire. Destê xwe avête destê wê û girt. Gava ku Mihemed destê Dîlberê girt êdî berê xwe dayê de. Lê Dîlberê kelegirî bû. Gelekî tirsîya bû. Têne li nav çavan Mihemed meyizand. Mihemed jî berê xwe da bû wê û her weha li wê dimeyizand. Mihemed li hevberê wê bêdeng bû. Çi gotin ji devê wî ji nav lêvên wî ne derdiketin di wê kêlîkê de. Her weha Mihemed bi bêdengi weke heyamekê li wê meyizand. Pişt re Mihemed hêza xwe li xwe da hevdu û li wê mayizand. Mihemed dixwast ku bi wê re bipeyive. Lê Mihemed ew yekê di xwe de ne didît ku bipeyive. Wilo li wî dihat ku gotinek ji devê wî derketiba, wê weke ku hêtak bi ser wî re wê bi xûrehene. Di wê kêlîkê de axiftin gelekî giran dihat. Lê Mihemed dîsan dida xwe ku bipeyive bi wê re. Gava ku çavên xwe biribûn ser ya wê û li wê meyizandibû, her weha hema wilo di cihê xwe de mabû û li wê dimeyizand. Di wê meyizandinê de carekê çavên xwe dibe erdê û li erdê dimeyizêne. Gava ku çavan biribû erdê her weha weke heyamekê serê wî di ber wî de ma bû. Gava ku serê xwe rakir da xwe û gotiyê de; 'ka ji min re bêjê ka ma kê ev yekê haniye serê te û çawaç' Dîlberê ku weke heyamekê piştî wê gotina wî re bêdeng ma, êdî serê xwe rakir û li nav çavên wî mayizand. Pişt re Dîlberê dest bi peyivtinê kir. Lê gava ku dipeyivî jî bi êşa dilê xwe dipeyivî;

'Ez li te dimeyizênim ku tu feqiyekî zanist î û te zanîn xwandiye. Çi wilo tê xuyakirin. Tu jî derekî tê û tê herî derekî.' Mihemed, piştî ku evan gotinan wê bihîstin, bersiva wê da û got; 'herê rast e, ez ji derekî tîm û ez ê herime derekî. Lê min çî dît min hingi jê xwe re got; xwezi ez pêpûk bim û nuha ne mirov bim ku min ev ne dîtî bana. Lê ji min re bêjê ez çî bikim? Ahdê min e ji te re ku ez te bi vî awayî ne berdim û herîm.' Dîlberê gava ku Mihemed her weha got hinekî bêhtir kelegirî bû. Lê di wê kêlîkê de ne dixwast ku bigiri. Dîlberê piştî ku Mihemed dipeyivî êdî wê jî li ruyê wî mayizand û gotiyê de; 'faqiho meyizêne li rewşa min, yên ku ez kirime vê rewşê de mirov in. Ez çî ji te re bejim? Ji biçûkatî ve min û kurêmê min me hez ji hevdu dikir. Lê malbatên me ne li hev bûn. Me jî got ku em werin nig hevdu me biryara xwe da ku weke demekê ji malên xwe biçin û paşê em ê vegerin malê. Em bi hev re ji malê derketin û hatin heremêke din ku li wir Reşîd beg serek e û em hatin mala wî. Lê Reşîd beg çav berda min û kuramê min kuşt. Min jî xwe ji destê wî rizgar kir. Lê ez ji wir ne derketim, ji ber ku hê cane laşê min li wir e. Hê xwîna wî li ser laşê min e. Vêca nuha ez ji te dixwazim tu herî mala me li nig bav û bîrayên min û ji wan re bêjî ku xweşka wan ji êşa dilê xwe bi çol û çiya ketiye. Lê dîsan bêjê êşa dilê wê na şikê. Ji wan re bêjê xwîna kurêmê wê li erdê ye. Laşê kurêmê we jî li erdê ye. Bêjê wan zûkin werin kurêmê xwe û xweşka xwe hildin. Bêjê wan agirê dilê xweşka wê gelekî mazin e. Bêjê bi wî agirê ku bi wê re ye çiya vêdikevin. Bêjê xweşka wê li serê çol û çiya dijî û bi sewalan re di nêçîrê de ye. Bêjê faqiho tiştê ku te dîtî, bêjê faqiho. Li pirtûka rastiye meyizêne ka ma çî tê de dinivisîne bihêne ser ziman. Meyizêne û bipeyive da ku rastiya min bibînin û werin êşa di dilê min de bibînin.'Mihemed piştî wan gotinên Dîlberê re dest bi

peyvîtinê kir û her weha jê re got ji kûrahiya dil; ' Te navê xwe ji min re got. Te got navê min Dîlber e. Ey Dîlbera dil êş, ez dibêjim ji te re ji dil ku peymanî te li dilê min ket. Axîna te ya dilê min bûye êşekî di dilê min de. Dîtina te di serê min de mazin cih girtiye. Êşa te min ji dil dîtîye û fahm kiriye. Ez bûme pira dîtina xwe îro bi dîtina te re. Ez bûme xwediyê êşeke mazin di dilê xwe de. Bi sê kelamê ji navê Xwudê kim, ez ê xwe gihênem mala wê û ez ê êşa dilê te ji wan re bêjim. Ez nuha li hevberê te rawesta me. Ez êşa dilê te dibînim. Ew kula ku çî li van çiyayan kiri evdal ez jî kirim evdalê te. Ew kula ku bi te re çê bûye, êşa wî kete dilê min de ji gava ku min te dît. Awayê jiyana êşa xwe bi te re mazin şanî min de. Êşa mazin min bi te re fahm kir. Ruyê qenciyê û neqenciyê min bi te re baş û mazin dît. Ey Dîlberê dil peymanî xwe min da te ku ez ê herîm û êşa te ji wan re bêjim. Ez ê êşa te ji mirovan re bêjim. Ez ê êşa te ji mirovan re bi rastteqînî bêjim. Ez ê bêjim ku ka min çî çawa û di çî rewşê de dîtîye. Rastiya wê bi hebûna te re bi min re were ser zimên. Rastî wê bi te re qenc û xirab were dîtî. Rastî wê bi te re û bi hanîna min ya ser zimên re mazin were têgehîştî. Êşa dilê te mazin e. Hingî rastî bi te re mazin li ber çavan e. Ey keçîka dil bi êş, li min meyzîne ku çend min ji te fahm kiriye! Ey keçîka delal meyzîne li min ka min çend êş girtiye ji te. Ey keçîka şêrîn meyzîne li min ka min çend kulekî mazin bi te re di dilê xwe de girt. Ey keçîka dil bi êş li min meyzîne lê li çavên min ne meyzîne ku da çî êş û fihêtiye min ne de ruyê min. Ey keçîka delal û şêrîn çî di ciwaniya xwe de pîr bûyî. Te ez jî bi dîtîne re kal kirim. Te ez ji çavçîsî û kelegirî kirim. Te ez jî çavşîl kirim. Te ez jî bi êş kirim. Ez ji dilê xwe re dibêjim ey dilo de bêjê du peyva. Ey dilo de bêjê du bêjeya. Ey dilo ji dilê bi êş bide ser ziman da ku ji

xelkê re bidim fahmkirin. Keçika dîlber û dilêş va ez dikevime ser rê. Ez ê çime mala we, bi bav û birayên te re bipeyivîm.'

Piştî ku her weha Mihemed bi Dîlberê re peyivî, êdî hewl da xwe ku bikeve ser rê û here mala wê û bav û birayên wê bibîne û bi wan re bipeyive. Berî ku here Dîlberê hat nig wî û hemaviyek ji ber xwe derxist û da Mihemed da ku bi xwe re bibe. Mihemed, gava ku Dîlberê hemawî daye de, rahişt û kire di ber xwe de û kir ku here. Lê gava ku kir ku here, hat li hevberê Dîlberê û weke heyamekê li çavên wê yên bi êş meyizand. Mihemed di wê kêlîkê de weke ku tijî bû dihate xuyakirin. Çavên xwe gava ku dibirine ser Dîlberê, xwe ne digirt ku li wê bimeyizêne. Çavên wê di wê kêlîkê de gava ku li wan dihate meyizandin, gelekî bi bal bûn. Çavên wê weke çirayekî vexistî bû dihatine xuyakirin her çend ku xemgîn jî bûn. Gava ku li çavên wê dihate meyizandin mirov digot qey çîk ji çavên wê diçin, dihate xuyakirin. Gava ku mirov ji ber royê dihate ber sîhwanê, weke ku ro tîrêjên xwe di çavên wê de bide nîşandan, dihate xuyakirin. Bi vî awayî çavên wê gelekî bi bal bûn. Çavên wê gelekî xweşik bûn. Çavên wê bejna wê gelekî xêşik didane ber çavan. Gava ku her weha li wê dihate meyizandin, bala mirov diçû ser çavên wê û pişt re jî bi wê yekê re diçû ser bejna wê ya ku li ber çavan bû. Mihemed her weha gava ku li wan çavên wê dimeyizand, gelekî di bin bandûrê de dima. Mihemed êşeke mazin gava ku li çavan wê dimeyizand dixwand. Gava ku êş ji çavên wê dixwend jî gelekî êşeke mazin dixiste di dilê wî de. Her weha gava ku wî li wê û çavên wê dimeyizand, gelekî di bin bandûrê de dima. Bi vê yekê re karê xwe dike û ji wir dike ku dûrkeve here. Lê destê wî ji wê ne dibû ku wê li wir bihêle û here. Vê yekê jî li wî bandûrek dikir. Di dilê wî de raperînek ji dîtînên wî hebû. Di dilê xwe de weke ku difûrî dihate

xuyakirin. Weke mirov ku di xewê de gelek xûlobatan bibîne dihate xuyakirin. Ew jî her weha di rewşekê de bû, ku xûlobatan didît. Lê xûlobatên ku didîtin ne di xewê de didîtin. Di jiyane de û şiyar bû, her weha dîtin. Mirov gava ku xûlobatan dibîne zû bi zû ji bîr nake. Her weha Mihemed jî tiştê ku dîti bûn ne dibû ji bîr bike. Ji tiştên ku dîti bûn gelekî bi bandûr bû bû. Mihemed her weha bi vê yekê re karê xwe kir û bikeve ser rê de da ku here nig bav û birayên Dîlberê û rewşa wê ji wan re bibêjê. Bi gavên lezê dabû ser rê û ji wir bi dilêş û dilbikul dûr diket.

Mihemed gava ku ji wir dabû ser rê, destê wî ji wir ne dibû. Gava ku gavên xwe diavêtin jî bi wî re giraniyeke mazin çêdibû. Gava ku ji nig Dîlberê berê xwe dabû ser rê ku here, çî gavê ku pêşîkê diavêt, pê re carekê jî li paş xwe ve dimeyizand bi aliyê Dîlberê ve. Hizra wî ji wir ne diçû û ew bi xwe jî ji wir bi dilêş diçû. Her weha weke heyamekê jî gava ku diçû ji li paş xwe ve dimeyizand. Ew bi xwe re di rê de bû diçû. Lê mejiyê wî li paş wî bû. Hinekî ji wê jî dûrketi bû. Di navbera çûna Mihemed û cihê ku Dîlberê lê dima qeşakî bilind jî bû bû. Lê dîsan dimeyizand li paş xwe ve di çûna xwe de. Mihemed gelekî di bin bandûra Dîlberê de ma bû. Rewşa ku ew tê de dîti bûn jî her dem li ber çavên wî bû. Mihemed di rê de diçû û bi lez jî diçû lê di serê wî de Dîlberê û cihê ku Dîlberê lê bû di hizra wî de bû. Têne ne di hizra wî de bû, bêguman li ber çavên wî jî bû. Li ser linga bû di rê de diçû lê weke ku di wê rewşê de di şiyariya xwe de di xewê de be lê dihat. Li ser lingan diçû lê dîmenên ji hebûna Dîlberê û rewşa wê di ber çavên wî de diçûn û dihatin. Her dimenên ku di ber çavên wî de diçûn û dihatin jî, bi wî re hestbûneke mazin çêdikir. Bi hestan re jî wî digot qey wek difûre lê dihat. Bi hestbûnê re gelekî çîsî dibû. Her weha di nav hestan de weke ku wî xwe winda dikir lê

dihat. Gavên xwe di wan esnayan de hê bêhtir dirêj û zûtir dikirin di rêveçûna xwe de. Di rê de çend zû diçû û çend di rê de kesek li pay kesekî diberde û ku kesên din yên nû derdiketine pêşiya wî jî hê bêhtir ji xwe re dikire hirahir ji ber ku ji kesekî digehê kesekî. Hirahira wî jî ne tenê ji bêbihna wî dihat. Her weha ji nexahebûniye wî jî dihat. Di lezê de û di çûnê de xwe winda kiri bû. Gav li pey gavê hê zûtir diavêt da ku hinekî hê zûtir xwe bigehîne cihê ku wê heriyê de. Her gava ku gav diavêt jî, jê re dibû bingeha gotineke ku di hundurê xwe de digot; 'a wa ye gavage dî jî çû, hinekî dî jî bi ber wir ve çûm.' Gava ku diçû hingî di serê xwe de dihizirî nezanibû ku çawa diçû. Her gavên ku diavêt bi rastî jî wî nêzîk dikir. Bi rêveçûneke ku nîvbaz rêve diçû. Lê rêveçûna wî weke ku rê têra wî ne dikir jê re dihat. Di wê kêlîkê de gelekî dixwast, ku hê zû here û bigihê nig birayên Dîlberê, da ku wê ji wir rizgar bike gavek bi gavekê hê zûtir. Lê çend zû jî diçû riya wî wisan zû hew ne dibû. Bi wê yekê re jî dida xwe da ku hê zûtir bibe di wê heyamê de. Bi vê yekê re jî gelekî bi qehr û hêrs dibû ji xwe re ji bo ku çima zû ne diçû di wê kêlîkê de. Lê çî kiri bana jî diviya bû ku wê rê qet kiri bana û çûba û xwe gihandiba mala bavê Dîlberê. Riya wî di wê kêlîkê de gelekî jê re dûtir dihat. Di rê de her weha wilo lê hati bû, ku gava ku kaşek dibuhurand digiha kaşekî dî ji xwe re bi hêrs dibû. Ji ber ku çima ew kaşê din derketiye ku cihê ku mal lê ne. Wî di serê xwe de dixwast ku di pişt wî kaşî de cihê ku wê çûba li pişt wî kaşî bana. Lê cihê ku ew ê çûba ne li piştî kaş bû. Êdî pişt re ji xwe re dihizirî de nexwe li piştî kaşê dî ye. Yan jî li pişt kaşê ku gehayê de ye. Her weha her kaşê ku digehayê de û jê dibuhurî li pista kaşê ku jê bûhûri dihizirî di wê heyamê de. Bi vê awayî di gelek kaşan de buhurti bû. Lê hê jî di rê de bû. Bi vê yekê re jî hersa wî bêhtir dibû ji wî re ji ber ku çima



hê ne gehaye. Di riya xwe de digeha gelek beravan û germavan jî lê li yekî jî ji wan ne dîsannkinî di rê de. Her weha tenê dixwast riya xwe berdewam bike, da ku hinekî hê zûtir bigehê mala bavê Dîlberê. Westiya bû jî. Lê westandina wî ne di bîra wî de bû. Tenê tiştê ku di bîra wî de bû ew bû ku dixwast ku gavek berî gavekê xwe bigihene cihê malê bavê Dîlberê. Ji ber vê yekê jî di serê xwe de dihizirî ku çend gavên xwe zûtir kiri bana, wê hê zûtir xwe bigehanda mala bavê Dîlberê. Bi vî hizra ku bi wî re çêdibû rê gavên xwe hê bêhtir bêhtir dikirin. Çend gavên xwe bêhtir jî dikirin germbûna laşê wî jî hê bêhtir dibû û ku germbûna wî hê bêhtir jî dibû hê bêhtir jî dixwast ku hê zûtir di rê de here, da ku hê zûtir xwe bigihêne cihê ku wê heriyê. Bi vî awayî di rê de xwe ji bir dikir û diçû. Riya wî di nav çiyayan de bû. Riya wî di nav çiyayên bekês û çolan de bû. Di riya xwe de digeha gelek tiştên xwezayê weke sinaçiya û daristanan. Di ber gelek daran re ku bi wan ve fêkî hebû jî dibuhurt diçû. Lê li yekî jî li wan daran ne dibû xwedî ku li wan meyizêne yan jî li nig wan rûnihê da ku behna xwe bistêne. Di vê xalê de tiştê ne di bîra wî de bû. Tiştê ku di wê heyamê de di bîra wî de bû ew bû ku xwe gehandiba cihê ku wê çûba.

Di rê de gava ku diçû ji gelek hizir jî di serê wî de çê dibûn. Gelek hizrên ji wan hizran ku weke pirsan dihatine ber bîra wî de, ew hê bêhtir ji xwe ve dibirin. Di serê xwe de dikir ku giha wir wê çî kiri bana, yan jî çî gotiba. Her weha hizr bi pirsiyaran di serê wî de çêdibûn. Gava ku giha wê derê di cih de diviya bû ku here nig kîjan birayê wê. Ev yek jî di serê wî de diçû û dihat. Di nav civakê û xelkê de her weha birayên mazin hinekî hê bi zanebûn û mazitir dihatine dîtin. Li hinek ciyan jî weke di dewsa bav de dihatine dîtin. Li wê herêma Kurdistanê jî her weha ev yek hebû. Birayê mazin gava ku

bav ne li malê ba yan jî çûba derekî dûr jî û zû ne vegeyiyaba malê, kurê mazin dewsa bavî de dihate dîtîn. Di wê heyamê de gava ku hinekan bixwastana ku tiştê bikiri bana yan jî bipirsîbana, digirtin û diçûn nig birayê mazin yê malê dipirsin. Her weha birayê mazin piştî bav re di nav civakê û xelkê de kevneşopiya xwe çêkiri bû. Ev kevneşopî ji gelekî ji rêzê dihate dîtîn di nav civak û xelkê de. Bêguman di her malekî de birayekî mazin hebû. Bi vê yekê re birayê mazin nêzîkatiya xwe di nav civak û xelkê de mazin ava dikir. Gotina wî jî piştî ya bav re ne dihate guftûgokirin û bi cih dihanîn. Mihemed wan taybetmendiyên hemûkan jî dizanibû û zanibû ku jî di nav civakê de çawa bi kar dihatine hanîn. Bi vê yekê re jî hizra ku di serê xwe de guftûgo dikir de, dizanibû ku wê çûba ku derê yan jî pêşî wê çûba nig kê. Mihemed gava ku li nig Dîlberê bû nûhatî bû hizra wî ku der heqê malbetê de pirsan bipirse di wê heyamê de. Ji ber vê yekê ji divêt mirov bêjê ku ji Dîlberê der heqê malbatê de tiştê ne pirsî bû. Her weha çend birayên wê hebûn an jî ne bûn ne pirsî bû. Di wê heyamê de jî ber dilêşîya Dîlberê ji xweçûnê wê, ew tiştêkî wisan ji wê ne pirsî bû. Tenê Dîlberê behsa bavê xwe kiri bû. Navê bavê xwe jê re gotî bû. Mihemed jî navê bavê wê bihîsti bû. Lê berî hingê ne dîtî bû. Ji nûke diçû wê derê û wê ew dîtî bana. Bi vê yekê re hinek xamîti jî pê re hebû. Lê Mihemed ji xwe bi bawer bû ku wê ji xamîtiya xwe bi buhure. Mihemed mirovekî ku di zanebûna xwe de ne xam bû. Bi vê yekê re lê baweriya wî hebû. Lê car bi car jî ji zanebûnê bêhtir jî hinekî dîtîn jî diviya hebe ku da ku xamîti ji holê rabe. Tenê ya wî ev dîtina wî ne bû. Lê diviya bû ku bi ser ve jî bi hatina. Wî xwe ji vî aliyê ve ji bo bi ser ve hatinê re bêgav û mecbûr didît. Di rastiyê de ji rewşa wî jî her weha bêgavîyek dide pêşîya wî di wê heyamê de. Sûnda wî ji wî re di dilê wî de hebû. Sûnda wî bi

wî re peymaneke mazin bû ji wî re. Bi vê yekê re ji xwe diviya bû ku bi ser ve were da ku Dîlberê ji wan şert û mercên ku tê de ye rizgar bibe. Wê ew jî ji aliyê wujdana xwe ve rehet bûba. Wî ne ev yekê ji xwe tenê ne jî aliyê wujdan ve ji didît. Ew ji aliyê mirovatiya xwe ve jî nêzîk dibû. Bi vî aliyê ve jî hestên wî xort û mazin bûn bi wî re. Her weha hestên wî mazin dihatine ser ziman bi wî re di wê heyamê de. Mihemed gava ku di rê de diçû di her gava wî de Dîlberê li bîra wî bû. Hebûna Dîlberê û rewşa wê ji bîra wî ne diçû. Gava ku diçû di rê de car bi car jî ku li ser Dîlberê ji xwe ve diçû û qirika wî tijî dibû. Dora çavên wî weke xet xwe didane kifşkirin di wê heyamê de. Ji dûrî ve gava ku li xetên çavan wî dihate meyizandin dihate têgehîştin ku mirov digot qey çavên wî şil in di wê heyamê de. Lê çavên wî ne şil bûn. Di çavên wî de hêsirên zûwa hebûn. Di hundurê xwe de bi bîrhanîna xwe de gelekî bi hest bû. Ev yek jî gava ku lê dihate meyizandin dihate dîtin. Her ku bi hest jî dibû, hê bêhtir dida xwe da ku xwe zû bigihêne mala bavê Dîlberê. Di rêveçûneke wilo de bû ku ne dîxwast ku qavzeken wî ji gavên wî yên ku berê ku avaçibûn kêmçir bin. Behne wî li ser dilê wî keti bû lê dîsan ne dixwast ku her weha hêza gavên wî kêmbin. Wilo lê dihat ku gaveke wî kêmbûba wê li paş maba. Ji ber vê yekê jî çend jê dihat her weha wilo hêz dida xwe da ku hê zûtir here. Hê zûtir here û erka ser şanê xwe hê zûtir bi cih werîne ji bo wê keçika reben Dîlberê. Di wê kêlîkê de Mihemed bi gavên xwe re gems digirt. Ne dihişt ku gavên wî di wê heyamê de wî behêz bikin. Çi kaşê ku dibuhurt ku digeha kaşekî dî jî, digot 'aha dibit ku li pêşiya vî kaşê ku li pêşiya min e li pêşiya wî kaşî kaşek heye, li ber wî ye. Ez hê bilezênim, ez hê zûtir xwe bigihim.' digot ji xwe re. Gelek kaşên ku jê buhurti bû û cihê mala bavê Dîlberê ne li pişt wan kaşan bû. Ta ku gihabû ber

kaşê ku di rastî de mala bavê Dîlberê li pişt bû. Lê wî ji xwe re digot ku ne li piştî wî kaşî jî be, wê li piştî kaşê din be. Rê evçend dûr bû. Gava ku ji xwe re dipeyvî, dengê xwe hes dikir. Ber bi roavayê re Mihemed digehê ser kaşê ku mala bavê Dîlberê li ber e. Gava ku ji ser kaş ve tê, malan dibine, êdî bêhneke kûr û mazin jî ji dil dide derve di.

Di riya xwe de hîç li derekî ne rawestiya bû ta ku were wir. Bi vê yekê re jî pir westiya bû. Ji wastandina bêhna wî, bi ser wî keçikê bû. Lê gava ku malan dîtî bû, gelekî dilxweş bûbû. Lê diviya bû ku têbigehê ma ka cihê wê ku hati ba, ev der bû yan na. Hebû ku cihê ku giha bû ne cihê mala bavê Dîlberê bû. Hizrên di serê wî de gelek bûn. Lê ku ne ew der jî ba, dîsan di dilê wî de rehetiyek çê bû bû. Dibit ku ew rehetî ji bihnedana wî dihat. Cihê ku ew diviya bû ku hati ba ne ew der bana jî, wê ev yek bi wî re dilêşbûnekê bi xwe re bihaniya. Mihemed ji vê yekê re amade bû. Gava ku mirov di weste, tiştêkî ku hêviyê dide mirov û ji mirov re mazin tê û her weha mazin di dilê mirov de cih digire, bawerkirin e. Yê wî jî her weha dîtina mala bi wî re hêviyeke mazin çêkiri bû û baweriyêk jî xisti bû di dilê wî de. Lê ta ku ne ew der jî bana cihê ku ew hati ba. Ta ku ji wir jî diviya bû ku hinekî din çûba. Mihemed hinekî wastahî bû. Lê ku cihê ku diviya bû ku wêriye ne ev der ba, wê dîsan dawiyê çûba cihê ku malê bavê Dîlberê lê bû. Wê çûba, ji ber ku bêguman wî dixwast ku here. Her weha biryara wî di serê wî de zelal bû. Çend westayî jî ba, wê westandina wî ev zelalbûna wî xira ne kira. Westandina wî ji zelalbûna wî re di dilê wî de çî nezelalî çê ne dikir. Mihemed di riyeke pir dirêj de û bi wastandineke mazin hati bû. Rewşa Dîlberê di serê wî de bû. Her weha di wê kêlîkê de gelekî ji wê dûr jî ketibû. Lê weke ku ew li nig wî be di wê heyamê de bandûrek li ser wî dikir.

Hebûna wê ya ku di serê wî de weke hebûna wê ya rast li nig wî li ser wî bandûrek diberda. Mihemed dihanî bîra xwe de car bi car gelekî bi hest dibû. Dîlberê di serê wî de hizrekî gelekî rast, mazin û bi bandur bû. Bi vê yekê re Mihemed gelekî di bin bandûra Dîlberê de bû. Gava ku di rÊ de diçû jî weke ku li nig wê be û ew li hevberê wî be li pêşiya xwe dimeyizand û diçû. Dîlberê li paşiya wî ma bû. Lê di rastiye de li paşiya wî ne ma bû. Dîlberê di serê wî de pê re hati bû. Gava ku li pêşiya xwe jî dimeyizand, weke ku li wê meyizêne diçû û gavên xwe diavêtin. Weke ku Dîlberê ne li paş wî mabe, weke ku li pêşiya wî be diçû û bi ber cihê ku here, gavên xwe diavêtin. Wî bi wî re her weha weke ku ew hinekî din nêzîktirê wê fikir di çûne de. Di serê xwe de Mihemed weke ku ber bi wê ve diçû bi gavên mazin diçû. Bi vî awayî jî di serê xwe de ew mazin dida hizirandin. Na, na Dîlberê li paşiya wî ne ma bû. Ber bi Dîlberê ve diçû. Çawa ku gava bihê cihê malê bavê Dîlberê, êdî wê ew jî li wir bihê bi wî re. Di serê wî de wê li wir be. Lê bi hebûna xwe re dibit ku ne li wir be. Ma gelo di wê kêlîkê de, ya girîng ne ew bû ku pêşî xwe bigehîne mala bavê wê di wê heyamê de? Dîlberê bi wî re ne hati bû. Wî bi têne dabû ser rê û hati bû. Bi vê yekê re jî ji bo ku Dîlberê ji wir hati ba, diviya bû ku Dilşad jî pê re hati ba. Dilşad di wê kêlîkê de ne li nig wê bû. Çawa ku Mihemed di wê kêlîkê de bi tenê di rê de bû ew jî bi tenê re li serê wî çiyayê Raz mabû. Çiyayê Raz weke ku ew di nav xwe de veşarti be bûbû. Çiyayê Raz bi razbûneke mazin re di wê kêlîkê de xwe dida jiyandin. Bi razkirinekê re dijiya. Bi evîndariyeke birîndar re dijiya. Çiyayê Raz di wê kêlîkê de bi evîndarekî ku hati bû maritandin re dijiya. Ew evîndar jî ku pelên baskên wê hemû jî jê hati bûn hilkişandin û ew bê taqeta firîbûne hati bû hiştin. Evînek ku difire xweş dibe. Evînek bi çeng û baskên xwe re bi hêybet e di

jiyanê de. Çiyayê Raz evîneke ku ji wan qasên hatî dûrxistin di hundurê xwe de vedişart û diparast di wê heyamê de. Razbûna çiyayê Raz xwe berda bû ser wê evînê hingê. Evîn di raziye de veşartî ma bû. Evîna ku li ber xwe dida di razbûnê de dijiya.

Mihemed gava ku hati bû serê kaşê, hinekî bêhnawî fireh bûbû. Gava ku malan dîti bû, êdî da bû xwe ku bi lezê here da ku here nav wan malan û fahm bike ku ka ma rast hatiye yan çewt. Gava ku dikeve ser riya malan, bi wê yekê re jî dihizire di serê xwe de. Hê bi yekcarî ni zani bû ku ew der e yan ne ew der e. Lê bi wî re dilperîneke jî dest pê kiri bû. Her weha ku weke heyamekê dihere êdî pê de digehê nav wan malan. Gava ku digehê nav malan, êdî ew jî çavên xwe digerîne, da ku ka ma ku hinekan na bîne ku ji wan bipirse ka mala bavê Dîlberê li ku derê ye. Gava ku dikeve di nav malan de û weke hinekî diçe, êdî rastê hin kesan tê. Gava ku digehê dahma wan mirovan slava xwe dide wan û bi slava xwe re li dahma wan diraweste û ji wan dipirse ku ka ma ew der e. Mirov gava ku bersiva wî herêni didinê de, ku ew li cihê mala bavê Dîlberê lê ye, êdî ew jî ji wan mirov lava dike ku wî bibine mala bavê Dîlberê, yê ku bi navê xwe Hêşo Axa ye. Gava ku her weha Mihemed bi xwastina çûne mala Hêşo Axa dibêjê, êdî hinek ji wan mirov serê xwe bi xemgîni dikine ber xwe de û li erdê dimeyizînin. Her weha gava ku weke heyameke li nig hevdu bêdeng dimînin û di cihê xwe de êdî yek ji wan ku bi mazinatiya xwe re navser dixuya, yekî ji axiftinê hez dikir. Li Mihemed nihert û jê re bi xemgînî got; 'Ez fêhm dikim ku tu yekî zane yî û biyaniyê vê heremê yî. Tu hatî nig axayê me. Ji rewşa te jî têt têgehîştin ku tu ji reyeke dûr têt. Tu li ser serê me hatî. Lê belê te hay nîn e ku axayê me çûye rahmetê. Em ji nûke ji çilê wî derketin. Lê ka were em ê te bibine mala wî. Kurên wî

ketine dewsa wî de. Kurê wî ye mazin mirovekî mazin e û nuha jî li dewsa bavê xwe dirûne. Ew jî bi navê xwe re dibêjinê de Badran beg. Bedran beg mazin e malê ye. Ji ber vê yekê jî ew nuha li dewsa bavê xwe dirûne. Yê navîn jî heye, ku xortekî gelekî baş e. Ew jî bi navê xwe Lolan beg e. Lolan beg jî mirovkî mazin e. Ew jî weke birayê xwe yê mazin civata wî li dora wî ye û di nav civata wî de ne bi axiftin e. Yê biçûkê wan jî weke begekî tê pêşewazîkirin. Mala wî jî li aliyê mala bavê wî wan e û li nêzîkî mêrga li ber avê ye. Ew jî bi navê xwe re dibêjinê Nîge beg. Nîge beg yê biçûk ê wan e. Axayê me bi du jin bû. Ew ên ku min nuha ji te re gotin, zarokên xatûna wî ya pêşî bûn. Lê kurekî wî yê dî jî heye. Ew jî ji xatûna wî ya duyemîn e. Ew jî bi navê xwe Memyan beg e. Ew jî mirovekî gelekî zane û tê dîtîn. Bavê wî jî gelekî hez jê dikir ji ber ku mirovekî pir bi fahm bû. Bi vê yekê re di nav xelkê de hat naskirin. Vêca ka tu were em te bibine mala axayê me. Li nig kurê wî yê mazin, ku nuha jî dêla bavê xwe di nav civatê de rûnişti ye û bi mirovan re dipeyive. Axayê me mirovekî xwedî zanebûn û mêr bû. Mirov gelekî qencî jê dîtî bûn. Bi vê yekê re ez bêjim mirov bi çûna wî yê ji nav me, gelekî dilêşîya wî girtin. Mirov her weha qencekî xwe winda kir.’ Piştî wan gotinan, Mihemed her weha li wan mirov û li ruyên wan meyizand û sersaxî ji wan re xwast. Pişt re di nav wan de yê ku navserî bû, li wî meyizand û gotiyê; ‘heger ji were ne be zahmet, hûn min bigehînin mala axê da ku ez sarsaxiya xwe ji wan re bidime nîşandan.’ Gava ku Mihemed ev yek got, êdî ew jî lê meyizandin û li hev jî meyizandin û yê navsere dihate xuyakirin; ‘bi xêr û silamet’ got û dan pêşîya wî û çûn mala axê. Piştî ku her weha herêkirin çê bû, êdî dane dû hevdu û ketine di riya malê axê de. Mihemed gava ku di nav wan de diçû, hem li wan dimeyizand û hem ji di serê xwe de li

Dîlberê dihizirî. Di wê heyamê de gava ku ew dipeyvî, wî tiştekek der heqê Dîlberê na hanî bû ser zimên. Lê gava ku bihîsti bû ku bavê wê emrê Xwedê kiriye, hê bêhtir dilêş bû bû. Gava ku di rê de diçû jî gelekî bi hizir bû. Mihemed ji riyekî gelekî dûr ve hati bû. Çawa ku bi rê ketibû jî, li çî derî ne rawestiya bû, ta ku hati bû wê derê. Gava ku lê dihate meyizandin jî dihate têgehîştin, ku gelekî westiya bû. Lê wî li wastandina xwe ne dîmeyizand. Têne yê ku di serê wî de bû, dixwast ku xwe bigehîne malê axê. Li mala axê wê çawa jê re çêl û bahs kiri ba ku baş hati ba têgehîştin. Her weha di serê xwe de bi van hizran, û bi rênîşanderên ku li dora wî pê re hati bûn ketine hawşa mala axê de. Gava ku Mihemed kete hawşa mala axê de, dît ku gelekî çûn û hatin hebû. Di nav wan mirovan ku diçûn û dihatin de, buhurtibûn odeya ku civat tê de rûniştibû. Gava ku ew jî ketine odeyê de, êdî wan ji slav dane yê ku rûniştine û bi slavbûna xwe re di nav civatê de rûniştibûn. Yê ew hanîbûn mala axê jî bi wî re buhurtibûn û di nav civatê de cih ji xwe re girti bûn û rûniştibûn. Mihemed piştî riyekî dirêj û bi wast gihabû mala bavê Dîlberê û nuha jî di mala bavê wê û di odeya wî de rûniştibû. Di civatê de kurê wî yê mazin di serî de rûniştî bû. Gelek mirov di civatê de hebûn. Piranî jî mirovên ku rûniştî bûn, yê ku hati bûn şîne, bûn. Mihemed di nav civatê de hinekî li dûrê Bedran beg rûniştibû. Cihê ku Mihemed lê rûniştî bû, hinekî nêzîki devê derî bû. Her weha Mihemed piştî ku rûniştî bû, weke kêlîkeke paşê dabû xwe ku bi aliyê ku Bedran beg lê rûniştibûyê bimeyizêne. Serê xwe ber bi pêşîya xwe ve hanî weke ku diq bike û bi aliyê ku beg lê rûniştibûyê ve meyizand. Gava ku serê serê xwe hanî pêşî û meyizand dît ku Bedran beg li serê civatê li ser cihê xwe rûniştî ye û bi yê li dora xwe dipeyvî.



Mihemed gava ku di cihê xwe de rûnişt, her weha weke heyamekê di cihê xwe de jî bi bêdeng ma. Car bi car ku mirov di rex de rûniştî bûn, jê re tişte ne pirsîbana, ne dipeyvî. Lê di hundurê xwe de jî gelekî bêtebat bû, dihate xuyakirin. Di navbera cihê ku ew rûniştibû û cihê ku beg lê rûniştibû, gelek kes hebûn. Car bi car li aliyê beg ve dimeyizand ji ber ku were xuyakirin ji aliyê wî ve û bi wî re bipeyive. Lê Beg di nav peyivtinê de, weke ku xwe windakiri bû dihate xuyakirin. Bi vê yekê re jî, ji xwe re dihizirî lê di cihê xwe de bêtebat bû. Mirov di nav civatê de rûniştî bûn, tev jî mirovên ku bi mazinatiya xwe re serwer û navser bûn. Hemûkan jî mirovên ku xwe didane guhdarkirin bûn. Gelek ji wan jî dihate têgehîştin, ku ji dûr ve hati bûn. Mirov ku rûniştî bûn, gelek ji wan cilên zadeganên herêmên din li ser wan bûn. Cilên herêman cûr bi cûr hebûn. Bi vê yekê re dihate têgehîştin ku gelek mirov ji wan mirovan ji cih û herêmên dûr ve hati bûn. Bi bêhtirî jî hinek zanistvan li wir hebûn û rûniştî bûn. Ew jî ji nêzîkatiyên wan û ji cilên wan dihate kifşkirin, ku zanistvan bûn. Cilên zanistvanan jî ne kêmi yê cilên zadeganan bûn. Ew jî bi gotin û axiftinan ve mirovên ku gelekî xuya bûn. Gava ku dipeyvîn jî, bi zanebûn, dengên xwe bilind dikirin. Ev yek jî weke ku zanebûna wan bi hebûna xwe re li ber çavan dihate xuyakirin. Ji her aliyên ve gava ku mirov li wan mirovên ku zanistvan bûn dimeyizand, gelekî jixweqayilbûna wan dihate ber çavan. Mihemed mirovekî zanistvan bû. Ew jî hêdî hêdî pê re qayilbûna wî çêdibû. Lê gava ku mirov bi Mihemed re jixweqayilbûnê şirove dike, mirov dibîne ku Mihemed bi du aliyên ve nêzîkî jixweqayilbûn dibû. Ev yek jî ji nêzîkatiyên wî dihate têgehîştin. Aliyek jê jî bi wî re, bi aliyê hizir û zanebûnê ve derdikete ber çavan. Aliyê dî jî şerê bi kibrê re xwe dadihanî holê û Mihemed gelekî jî ji vê aliyê acizbûna xwe dihanî

ber çavan. Mihemed hez ji nêzîkatiyên kibrê ne dikir. Ev aliyê dawiyê dibû bingeha acizbûnên ji ber ku xwecudadîtin û xwe li ser mirov re mazindîtin pê dihate ber çavan û Mihemed jî ji vî aliyê pir aciz bû. Mirov ku zanistvan ba, ku ji van taybetmendiyan ve hinek nêzîkatî pê re diyar dibû. Mihemed van taybetmendiyan bi herdu aliyên re jî li gelek cihan dîtî bûn. Bi vê yekê re jî zanibû ku van taybetmendiyan çawan in û bi çî awayî re dihênine ser zimên. Gava ku Mihemed ketibû di nav civatê de û rûniştî bû, li dora xwe pir bi bal dimeyizand. Mirov ku li dora wî rûniştî bûn, hemû jî mirovên ku di nav civatê de pir mazin bûn. Lê ta Mihemed bêhtir jî di wê kêlîkê de ne li ser wan bû. Gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bêhtir jî ji vî aliyê ve ne di serê wî de bûn. Ew ji ber tiştê hati bû wir û hê ew tiştê ku bi cih bihaniya, ne hanî bû. Vê yekê jî ew bêtebat dikir û diêşand. Mirovên ku di rex wî de rûniştî bûn jî, gava ku li wî dimeyizandin ev bêtebatbûn bi wî re pir baş û mazin didîtin û fêhm dikirin. Mihemed her weha di nav civatê de pir aciz dihate xuyakirin di wê kêlîkê de.

Gava ku Mihemed çendî bîstekê di cihê xwe de rûniştibû û hê bi beg re mafê xeberdanê ne hildabû, ku bipeyive, di acizbûna wî de êdî bi dixuya û bêhtir xwe dida ber çavan. Wilo li wî dihat ku ji wê de pê de êdî tebat ne dikir ku wisan bêdeng di cihê xwe de bimîne. Mirovên ku ew hanî bûn wir jî, hinek ji wan di rex wî de rûniştî bûn. Gava ku Mihemed careke din li beg mayizand û dît ku beg hê dipeyive, fahm kir ku wê zor be ta ku ji aliyê beg ve were kifşkirin di wê heyamê de. Bi vê yekê re li yekî ku pê re hati bûn mala axê peyivî û gotiyê; 'ma tu dikarî min bigehînî mala beg yê ku bi temenê xwe re di bi bin Bedran beg de ye?' Gava ku Mihemed ev yek jê pirsî, bersiva herênî hilda û karê xwe kir ku bi hev re rabin herin. Gava ku

karê xwe kirin, ku rabin û hema ku rabûn ser çogên xwe, beg ew kifş kirin. Beg bi dengê bilind bi aliyê Mihemed ve xwe zivîrand û peyivî li wî; 'seydayê min, tê çi bikî? Hê em bi hev re ne peyivîne jî û çi zû wilo tê herî? Tê xuyakirin ku tu ji dûrî ve hatî. Me xwe di nav peyivtinê de bir û hanî û em bi te re ne peyivîn. Li me bibore! Na çê na be ku tu her weha ji malê derkevî û herî. Pêşî ez bêjim ku tu bi xêr hatî vir. Tu mêhvanê me yî, de keremke cihê xwe û li rehetaxwe bimeyizêne.' Mihemed gava ku beg lê meyizand û peyivî, her weha êdî Mihemed jî bi vê peyivtinê re di cihê xwe de ma. Bi axiftina ku bi beg kirî re jî, bala mirovên li civatê jî çûbû ser wan. Bi vê yekê re Mihemed jî her weha bersiva beg di cihê xwe de da; 'rast e begê min, ez ji dûrî ve tîm ku ez axeyê xwe bibînim. Lê min ne dît. Min bihîst ku koçê dawiyê kiriye. Min jî dela wî tu dîtî, ku di cihê wî de rûniştîyî. Du sê gotinên min yên ku gelekî girîng hebûn min ê ji axayê xwe re gotiba. Hinek gotinên bi dilêş bûn. Lê min dît ku bi hebûna wî re jî dilêşbûna wî çê bûye, çûye ber dilovaniya Xwedê. Ez jî aliyê Cûlemergê tîm. Ji Miksê me. Axayê min em nas dikirin. Begê min naskirinên axayê me jî gerek nas bike. Ew jî mazinatiyek e. Ez ji riyeke dûr ve dihêim ku bi axayê xwe re tiştê gelekî bi dilêş bidipeyivim. Bi vê yekê re pêşîkê slav û rêzên min herê bike û pişt re li min bihişêne ku di nav civatê de ez ê çend peyvên dilêş dipeyivim. Çi bêjim û ez çend ji dil bipeyivîm.. Êş ku têt dîtin jiyane gran dike. Êş ku têt gotin jiyane bi êş dike. Êş ku têt gotin û têt zanîn êşa çê dike. Begê min! Kurê mî te û xwuşka te bi hev re reviyane, çûna. Lê haya we ji wan nîn e ku çi hatiye serê wan e. Vê yekê jî li bihesêne û bizani be. Lê ku nuha we li min hesand û min ji axiftina xwe hewkir, hûn ê hem ji wan bi agehdar bin û hem jî dilê we bi êş be. Pêşîkê divêt ku yê bi êş ji we re bêjim, ku xwuşka we û kurê mî

we gava ku bi hev re çûbûn, ne dixwastin dilêşiyekê çêbikin. Dixwastin ku bi we re lihevbûnekê çêkinloma çûbûn. Bi hev re çûn, lêbelê hezkirin jî bi wan re di dilê wan de ji bo hevdu hebû. Bi hev re diçin xwe li Reşîd beg ku kurê Silo Axa ye digirin. Ji gotina ku min bihîstiyê dibêjin Silo Axa mirovekî gelekî baş bû. Bi vê yekê re xwuşk û kurê me te diçin xwe li wan digirin. Lê gava ku diçin mala Silo Axa, kurê wî Reşîd beg li wir dimîne û li dewsa wî dirûne. Ew jî gava ku xwuşka we û kurê me we bi hev re dibîne çavên wî diçin ser xwuşka we û dixwaze bibe xwediyê wê di wê heyamê de. Bi vê yekê re kurê me wê jî dikuje. Gava ku kurê me wê dikuje, êdî xwuşka wê jî xwe ji destê wî rizgar dike û xwe dispêre çiya. Nuha divêt ku ez ji wê re bêjim ku xwuşka we bi wê êşa di dilê xwe de xwe sipartiyê çiyayê Raz. Nuha çiyayê Raz wê diveşêre. Ez nuha ji wir tem bo dîtina wê ku dilê min gelekî êşandiyê. Wê ji min re gotiyê ku here êşa di dilê min de û rewşa min ya ku te dît, ji wan re bêjê ku da werin êşa min dilê min bibînin.’ Bi wan gotinan re bêdengi bi hemû mirovên ku li wir rûniştî bûn çê bû. Hemû jî wilo li çavên Mihemed û yê Bedran beg dimeyizandin. Gava ku beg gotinên Mihemed seh kirin û Mihemed gotinên xwe hewkirin, beg ji cihê xwe rabû ser xwe di wê heyamê de. Gava ku beg rabû ser xwe, her weha bi hinek gavan re hate nig Mihemed û li hevberê wî rawesta û her weha jê re û di nav civatê de dipeyvî; ‘Seydayê min, te bi van gotinan re dilê me kire pûc û hûrhûr kir. Diya me û ya wê ne yek e. Lê em ji xûnekê ne. Tiştê ku te nuha gotî ji min re, li ber wan gotinên te rawestî jî bêxîretî tê jimartin. Em çî carî vê yekê herê na kin.’ Bi vê yekê re Bedran beg bang kire xûlamên xwe û bi wan re xeber şande ji birayên xwe yên din re ku di cih de werin wê derê nig wî da ku bi hev re bin. Bi wê yekê re mirovên ku li dora wî bûn bi wan re jî bêdengî berdewam

bû. Di rewşên weha de gava ku kî amade be, diviya bû ku xwediyê malê bi têne ne hişt. Yên li wê derê hemû jî li nav çavên Bedran beg dimeyizandin weke jê re bejin, ku ka ma em çi bikin? Bedran beg di wê heyamê de gelekî bi qahr dihate xuyakirin. Her weha gava ku xûlamen wî jî çûn ku xeberê bidin begên din ku ew jî werin nig wî di wê heyamê de, ew jî li ser lingan bû û li paş ve li xûlaman dimeyizand ta ku ji ber çavan winda bûn.

Mihemed gava ku gotinaxwe goti bû, êdî weke ku hinekî rehet bû bû. Lê di dilê xwe de hê jî weke ku ne rehet bû. Dîlberê di mejiyê wî de bû. Gelekî li ser Dîlberê dihizirî. Gava ku ji wir hati bû, Dîlberê li wir bi tenê ma bû. Ev yek jî di mejiyê wî de bû. Bi vê yekê re jî ne rehet bû. Bedran beg jî li ser lingan bû û li pêşiya wî bû. Bedran beg kurê Hêşo Axa yê herî mazin bû. Di nav zarokên wî de jî yê yekêmin bû. Bavê wî pir hez jê dikir. Bi temen jî mirovek ku ne biçûk bû. Ew bi xwe jî xwedî jin bû û navê xatûna wî jî Rejnîser bû. Rejnîser jî ji mala axê bû. Gava ku Bedran beg têt 18 salî, êdî Hêşo axe Rejnîser'ê bi wî re mar dike. Mala bavê wê mala axê bûn. Di dema xwe de gelekî bi nav û deng jî bûn. Lê di şerêkî ku hêrisê de ku hinek leşkerên osmaniyan têne ser herêma wan, hêza xwe winda dikan. Piştê eşîra bavê Rejnîserê Hasê Axa di wê hêrişê de têt ser wan de dişikin û winda dikan. Hasê Axa di nav eşîrê de ne bi nav Hasê Axa dihate ser ziman. Mirov bi wî navî ji ew nas dikir. Lê belê piranî digotinê de Eliyê Hasê. Navê bavê wî jî Hasê Axa bû. Navê wî jî bavê wî kiri bû Elî beg. Lê Elî Beg zû de dimire. Gava ku bavê wê ji zû de dimire, êdî Eliyê Hasê jê re têt gotin. Lê êdî bi navê bavê wî weke Hasê Axa jî jê re te gotin. Mirov ku gelekî bitfire bû û eşîra wî jî mazin bû. Navê herêma wî jî digotinê de Rizbinê. Rizbinê jî herêmeke, ku gelekî mazin û kevn bû. Cihekî ku xwediyê dîrokekî

gelekî kevn bû. Li Rizbinê gelek fileh û êzdî jî dijiyan. Lê navenda wê piranî jî fileh bûn. Di wê herêmê de bêhtir fileh hebûn. Ji ber vê yekê jî ji aliyê çanda olîtiya filetiyê ve jî cihekî ku gelek pêşketî bû. Dera Rizbinê jî mazin û bi nav û deng bû. Piştî bisilmanetiyê jî hebûna wê berdewan kiri bû. Çend li herêmê hêriş bûbûn jî dîsan wê derê hebûna xwe berdewam kiri bû. Mirov digotiyê de Dera Derizibînê. Pişt re her weha navê Derê bi navê herêmê ve dibe yek û dibe navê herêmê. Navê Derizibînê ji herêmê re dimîne. Lê gava ku hêrişên osmaniyan dihên ser herêmê, êdî herêm bêhtir li ber xwe na de û dikeve. Hasê Axa jî di ser de têt kuştin. Ji Malbata wî jî yê ku dimînin sax jî, hinek ji wan dihên nig Hêşo Axa ku xwe bisipêrinê de. Hêşo Axa wan dike nav xwe de û diparêze. Di wê demê de gava ku tên, Rejnîserê hingê 13 salî ye. Gava ku tên û pişt re ew jî mazin dibe, êdî ew û Bedran beg bi hev re tên markirin. Rejnîserê û Bedran beg di temenê hevdu de bûn. Ji wê herêmê hinek êzdî jî hebûn ew jî yên ku di filitîn diçûn herêma Mûşê yan jî herêma Laleşê. Li herêma Mûşê ji eşîrên êzdiyan gelek hebûn û ji aliyê hêzê ve jî ne kêmbûn. Rejnîserê piştî ku bi Bedran beg re mar bû, êdî pê de sê zarokên wê çê bû bûn. Keçek û du kurên wê bûn. Zarokê wê yê pêşî kur bû. Ew jî di wê demê de baş mazin bûbû û gihabû 16 salên xwe. Mirovekî gelekî jêhatî jê derketi bû û navê wî Sekban bû. Gava ku hêriş têt ser herêma bavê Rejnîserê, êdî ew herêm gelekî bêmirov dimîne. Keçên ku sax dihênin girtin jî gelek ji wan ji aliyê leşkeran ve tên birin. Her weha ji eşîra Rizbiniyan çî kesek din na filite. Yên ku difilitin jî gava ku hêriş wê bibe û berî ku bibe, leşkerên ku diçe ku hêriş di rê de ye, ji aliyê mirovan çawa dihên dîtin, xeberê digihênin eşîrên dorê da ku werin bi hawara wan ve. Yên ku rizgar dibin jî gava ku suwarên eşîran diçin û tên, êdî yên hêrişker jî ku baz didin diçin

rizgar dibin. Di wê heyamê de yên ku ji wan dimînin sax jî rizgar dibin. Lê gelek ji wan yên ku dimînin sax jî, weke keçên wan hêrişkaran bi xwe re dibin û diçin. Bi vê yekê re, herêma dimîne vala ji mirovan. Lê yên ku destên wan ji warên wan na bin jî, li herêma xwe divegerin û carekê din jî hebûna xwe bêhtir dikin û berdewam dikin.

Bedran beg her weha piştî ku Mihemed jê re behsa Dîlberê kiri bû, êdî ji cihê xwe rabû bû û ne rûnişti bû. Hadana wî ne dihat ku rûne. Mirovên li dora wî jî, bi wî re weke ku bêhadan bûn, dihatine xuyakirin. Her weha li ser lingan ma bûn û li hêviya birayên xwe yên din bûn ku werin. Di wê heyamê de mirovên ku li wir weke serokê êlên din hati bûn wir, xeber dişandine ji herêma xwe re, da ku ji bo her rewşê xwe amade bikin. Bi vî awayî gelekê lebateke mazin dest pê kiri bû. Lê lebateke ku bi bedran beg re hê mazintir bû. Bedran beg gava ku xebera Dîlberê seh kiri bû, êdî ji her aliyê ve lebat û bidengi pê re çê bû bû. Mirov ku di wê kêlîkê de dihatine hevberê Bedran Beg pir bi bal li nav çavên wî dimeyizandin. Mereq, Lebatî, bidengi, hêrsbûn û her weha qaharandin ji ruyên mirovan xwe mazin dida derve. Mirov ku li nig Bedran Beg diman jî gelek ji wan jî bi bêdengiyê ku dixwastin ku fahm bikin ku ka ma wê çi bibe, wisan di cihê xwe de ma bûn. Gava ku dihatine meyizandin, dihatine têgehîştin ku di her rewşê de wê tiştek bûba. Lê ka ma wê çi bûba ew yek ji hê ne xuya bû. Di wê heyamê de jî hêdî hêdî birayên wî yên din jî çawa ku xeber hildabûn, ew jî keti bûn rê de û hati bûn. Di wê heyamê de birayê wî yê biçûk pêşîkê dabû devê derî û hati bû. Ew jî yê ku bi navê Memyan Beg bû hati bû. Memyan Beg birayê Dîlberê yê ku bi hev re ji dayikekê bûn. Hêdî hêdî birayên wî yên din jî dihatin. Gava ku ew jî hatin, hemûkan li nig hevdu kom bûn.

Bedran Beg êdî ku gava hemû hatin ji wan re dest bi axiftinê kir: ‘Î roj min tiştêk bihîst ku pişt koçkirina bavê min re ji me re gelekî giran e. Xwuşka me gelek tiştên ku ne baş in hatine serê wê û nuha wê bi hebûna xwe re xwe spartiyê Çiyayê Raz. Em ji bavê xwe fêr bûn, ku em di her demê de bi hev re bin û li nig hevdu bin. Î roj rojêke weha ye ji bo me. Dilşad hatiye kuştin. Ew jî ji me ye û kurê me ye. Çend malbatên me ne li hev bin jî, dîsan ev yek divêt ku em rast û herê bikin. Dilşad xortekî gelek hêja bû. Bi xwuşka me re hevdu revandibûn. Çûbûn mala Silo Axa û xwe li wan girti bûn. Lê Silo Axa ne li jiyânê bû û kurê wî ye bi navê Reşîd Beg di dewsa wî de û destê xwe kiriye xûna kurê me û xwuşka me. Hûn jî dizanîn ku em ji nûke ji çilê bavê xwe derketin. Hê ku êşa bavê me dilê me dişewitand, êşeke din ket dilê me. Ev yek ji me re gelekî gran e, ku di vê demê de me ji malbate xwe hinekên din jî windakirin. Piştî ku bavê min rahmet kir êdî ez weke mazin ê we û malê me. Min biryara xwe ya pêşî her weha li ser êşa me de. Vêce nuha min bang li we kir ku ez ji we re bêjim min biryara şerê li Reşîd Beg bikin da! Hûn jî xwe ji vê yekê re amade bikin. Rabin ku em herin xwe bidine nîşandan ji Reşîd Beg re ku ka ma em kî ne.’ Piştî van gotinên Bedran Begê, di ruyên birayên wî de û di yên dora wî de matmayin, hêrsbûn xwe dabû nîşandan. Bi ve matmayinê re her kesek di cihê xwe de bêdeng mabû. Mihemed jî her weha di cihê xwe de bêdeng ma bû. Êdî karê şerê li ser Reşîd Beg dihate kirin di wê heyamê de. Mirov ku diçûn û dihatin êdî gelek bûn. Çi mirov tiştê ku Reşîd Beg kiri bû ne dipêjirand ji ber ku ne hebûn û ne jî çanda civakê vî tiştî dirakir. Karekî berûmet bû. Kî jî ba, bêceza ne dihate hiştin. Di wê heyamê de xeber zû digehê eşîrên ku li hawîrdorê diman. Ew jî vê yekê ne dipêjirandin û xeber ji Bedran



Beg re di şandin, ku pê re bûn. Eşîrên hawîrdora weke serek, eşîra Bedran Beg didîtin. Di serokatiya eşîrê de gava ku axa bimore êdî yê ku were cihê wî, di çûn û hatina mahzitiyan de ye ku di cihê wî de di dewsa wî de dirûne ku wê bibe axa. Ew yekê jî weke kevneşopiyêkê bi cih dihate hanîn. Piştî ku bavê Bedran Beg jî koçê dawiyê kiri bû, êdî weke yê mazin ew çûbû ser û weke serekê di nav mahzitiyan de bû. Bi vê yekê re çawa ku Hêşo Axa diçe ber dilovaniya Xwedê, êdî Bedran Beg jî mirovê ku dihatin mahzitiyê pêşewazî dikir. Bi vê yekê re ew jî êdî her weha dibû weke serekê eşîra û wilo dihate naskirin. Bi vê yekê re êdî biryara ku Bedran Beg bida, çi kesekî ni kari bû ku bêjê ku ez herê na kim di nav tevaya eşîran de. Bedran Beg her weha êdî serekê eşîrê bû û wê hêdî hêdî ji bûba Axaye eşîra di demê de. Axatî weke rewşeke sereke bû.

Di mala axê de amadekariyeke pir mazin dihate kirin ji bo ku herin şerê li ser Reşîd Begê. Bedran Beg nuh hati bû ser eşîra xwe û diçû şer. Mirov tev li dora wî bûn. Gelek mirovên ku hê di dema bavê wî de li nig wî bûn, nuha dîsan bi wan re û li nig Bedran Beg bûn. Ew mirov jî mirovên ku sereke bûn û pir zane jî bûn. Ta wê kêlîkê Bedran Beg çi biryar dabû deng ji wan ne derketi bû. Gelo ji ber ku xelet didîtin loma deng ne didan an jî gerek ne dîtin ku bipeyivîn. Axiftina wan bêguman wê hê bêhtir bawerî daba Bedran Beg di wê rewşê de. Lê deng ji wan ne derketi bû. Di ciyên xwe de bêdeng ma bûn. Ew jî wê bi begê xwe re çûbana şerî. Wan jî amadekariyên xwe dikirin.

Mihemed jî piştî ku bi Bedran Beg re dipeyivî, êdî mabû bêdeng di cihê xwe de. Ew jî di rewşê xwe de dihizirî û dihizirî. Lê çi dihizirî ji di serê xwe de dihizirî. Di wê kêlîkê de çi kesekî nizanibû ku çi di serê xwe de dihizirî. Lê mirov ku ew ji ku derê hatiye û çi jinbû ye û

her wêhê çî dîtiye ku zanibihêne wê zan bikirene ku ka ma çî dihizire an jî çî di serê wî de heye. Mihemed gelekî bihizir bû û di cihê xwe de sekinî bû. Mirov li dora wî diçûn û dihatin di wê heyamê de. Beg jî di wê heyamê de li nig wî bû. Beg li ser duseke di cihêLê wî ye rast e de rûniştibû bû. Lê bi hev re buhurtibûbûne nêzîki cihê ku beg Lê dirûnişt. Mirov ku li dora wan jî li wan bi bal dimeyizandin. Ta wê kêlîkê Mihemed ne di bala wan mirov ku li wir rûniştibû de bûn. Lê gava ku her weha ku mihmed biaxiftin dîti bûnn êdî fahmkiri bûn ku ew mirov ne mirov ku nezane û bezane. Bi vê yekê re bala mirov çûbû ser wî. Bedran Beg jî li oda rûniştinê de geh dirûnişt û geh dirabû ser xwe de. Ew behadan bû. Di wê heyamê de bi hadanbûn jî bêguman hinekî dijwar bû. Nexasim mirovên wek wî ku çavên hemûkan jî li ser wî bû di wê heyamê de. Di rewşên weha de mirov li gavên began an jî axayan dimeyizandin. Beg yan jî axayên wan, jî wan re dibûn rêber di rewşên weha de. Bal û çavên her kesî li ser Bedran Beg bûn. Mirov li gavên wî dimeyizandin. Rewşa wî helak bû. Beg di wê heyamê de li dora xwe dimeyizand û li yên dora xwe ne qadr û qiymetê dida wan. Ne têne di wê heyamê de di her heyamê de ev yek hebû. Lê di rewşên weha de diviya ku di bin zanebûnê wan de gav bihatina avêtin, da ku di xeletî ne hatina kirin. Amadekariyên şerê de hêdî hêdî digeha dawiyê. Her kesekî yê ku wê çûba şer, hêdî hêdî xwe amade dikir. Lê bêguman wê kengî çûbana çî kesekî jî tiştek ni zanibû. Di serê çî kesekî de çî hizîrek ne bû. Lê gava ku li ruyê wan mirovên ku xwe di wê heyamê de amade dikirin dihate meyizandin, dihate dîtin ku gelekî bi hêrs û qahr bûn. Hemûkan jî yên ku xwe amade dikirin peya bûn. Hemûkan jî berî hingê gelek geştê şerî kiri bûn û şervanên baş bûn. Hemû jî simbêlqeytan bûn. Hemûk jî şûr û xencerên wan di ber wan de, bi

wan re bûn. Hemû jî ji bo şer xwe bi şûtikan girê didan û li hêspên xwe suwar dibûn. Mirovên sereke jî her weha li nig beg bûn û hê li hundurû bûn. Hinek ji wan mirovan ku serek bûn û di amadekariyan de cih digirtin jî, diçûn û dihatin di nav mirovan de. Di şerekî de diviya bû ku kêmasî ne hatîbana jînkirin. Gava ku kêmasiyek derketiba, dibit ku ew kêmasî bûba bingeha tekçûna wan di wê heyamê de. Ji ber vê yekê jî pir baş diviya bû ku wan xwe amade kiri bana û bi bal û serinc bana. Her weha encax wê serwerî rewşên ku derketibana pêşiya wan bûbana. Di her rewşê de ji bo ku serkeftin were pê, divêt ku mirov serwer be. Serwerbûn jî xwe baş amadekirin û hizirandinê re çêdibû. Ev herdû aliyên ku di bingeha xwe de zanebûn parastin, êdî mirov dikarê bêjê ku wê serkeftin bihaniyana ji xwe re. Zanebûn di rewşên weha de gelek bi nîrx e.

Gava ku digehîjin ber bi esrê ve êdî hema mirov dikarê bêjê ku amadekariyên wan ber bi dawî dihatin. Wa ye dibû êvar. Ma gelo wê ber vê êvare rê kevinê de? Wilo dihate xuyakirin ku her weha wê bi êvarî jî bana, wê ketibana rê de. Gava ku bi ber bi êvarî re xeber dane beg ku amadekarî ber bi dawiyê ve tîn, êdî beg jî amadekariyên xwe kiri bûn. Bedran Beg gava ku amadekarî hew dibin, Memyan Beg da nêzîkê xwe û li pêşiya suwaran di rastkirinê de ku jê re bibe alîkar. Lê Bedran Beg komeke dî jî, ji suwarên ku gelekî xort in, dide amadekirin û Lolan Beg jî da ser serê wan û bi rê ket. Ew kom jî koma suwaran bû û gelekî bi hêz û xurt bû. Ew kom jî wê li pêşiya wan çûba, hem ji wan re rê vekiri ba û hem jî, wê li pêşiya wan wê xwe gihandi ba cihên ku herinê de, ku çî tiştên nebaş ne bin. Lê her cihê ku tê re wê çûban jî, li hinek cihên ku wê kifş bikin wê hinek mirovên din li wir bigrin nav xwe û bibin yek. Ev yek jî hem ji bo ewlekariyê bû û hem jî ji bo ka ma hêzen Reşîd Beg

çawan e û li ku derê bi cih in werin kifşkirin. Di navbera Lolan Beg û Bedran Beg de jî Nîge Beg ji wê koma pêşî bû û wê li pêşiya Bedran Beg û wan çûba. Ji aliyekî din ve jî wî hinek komek din dabûn amadekirin. Ew kom jî wê di cihê Bedran Beg û wan re biçûna. Lê wê ji wan ji bêhtir ne dûrbana, daku kari ba di cih de xwe bigehandinawan di rewşên nebaş de. Cihê ku lê kom bû bûn jî, wê koma Lolan Begê kifş kiri bana û ewlakariyê hildabana. Lê Lolan Beg jî bi suwarên xwe re wê ji dûrî ve wan parastiba. Lolan Beg jî her weha li pêşiya xwe hinekî mirov ku ji aliyê leşkerî ve û ji aliyê zanebûnê leşkerî ve baş bûn şandi bûn da ku rewşa herêmê jê re bêjin û wî agehdar bikin. Ew suwarên ku li pêşiyê jî diçûn, cihê ku wan xwe digihandiyê de, li wan deran jî wê çavdêrên Lolan Begê didanîn. Ji aliyê çavdêriyê ve ew mirovê pêşeng weke zemanêkî çavdêriyê bi xwe re çê kiri bûn. Çavdêrî ewlekarî ye û her weha gelek çavdêrên wan hebûn. Yê ku di pişt wan de diçû jî ji wan nîşanan fêhm dikirin ku ka rewşê wê derê çawa ye. Wan suwarên pêşeng jî, ji aliyê naskirina herêmê ve jî gelekî xwediyê hunereke mazin bûn. Bedran Beg her weha ji paş xwe ve jî ewlakariyeke mazin girti bû. Ji hev jî ne dûr û bêtêkilî bûn. Bedran Beg rastkirineke wilo kiri bû ku gelekî ewlekarîyeke mazin ji wî re û ji şervanên wî re çê dikir. Bi çendî ku rewşa Lolan Beg ji wan re dibû ewlakar, ya wan jî ji wî re dibû ewlakar. Hêza ku bi Nîge Beg re jî bû, Bedran Beg dabû pêşiya xwe û pişt Lolan Begê. Nîge Beg bi hêza xwe re dikari bû ku xwe di cih de bigehanda herdû aliyan jî di wê heyamê de. Hêza Nîge Beg hêzeke ku hem ji ewlakariyê re bû û hem ji lêxistinê re. Hêza Lolan Beg jî, hem ji ewlakariyê re bû û hem jî parastin û çavdêrkirinê re bû. Ji xeynê wan hêzan jî, hêzeke ku di rewşên nebaş de bi du aliyan ve wê kari ba bal bikişanda ser xwe jî,

hati bû amadekirin. Hêzen bal kişandine jî bi çendî ku weke komên teybet hati bûn amadekirin her weha jî weke ku di nav koma Lolan Begê de bi alî û bi nîzam bûn û her weha komên ku dikari bûn ku bi serê xwe jî gavên biavêtana hebûn. Di nav komên din de jî her weha weke vê koma balkişandina komên din jî, yê bal kişandibin hebûn. Lê hebûna wan diviya bû ku ne hati ba kifşkirin. Lê taybetiyekî wan koman hebû ku gelekî girîng bû. Gava ku ketibana tangasiyê de di cih de bi hêz dibûn. Ev yek jî ji rastkirinên koman dihat. Bi çendî ku her weha bi hev re bi têkilî bûn, her weha jî ji hev bi pêwendî dihatine xuyakirin. Bi vê yekê re Memyan Beg jî bi mirovên zane û yê ku li dora rastkirinê kar dikirin. Memyan Beg yekî ku hê cuwan bû. Lê ji aliyên weha ve mirovekî zane bû. Gava ku Memyan Beg rastkirin dide avakirin, ta ku kîjan mirov wê li kîjan hespê jî suwar be, yan jî li hespekî çawa suwar be dida kifşkirin. Wî ev yek jî gelekî girîng didît. Li gor wî 'mejiyê mirov di rastkirinê de têkneçûnê kifş dike.' Wî her weha gelekî girîngî dida rastkirinê. Ji bo van fêrbûnên xwe jî bi mirovekî ku ji aliyê hizir ve mazinbûn pê re hebû. Li dora wî gelek mirovên ku zane bûn hebûn. Wan mirovan jî ji aliyê mejî ve yan jî ji aliyê rastkirinê ve wî pêş xistibûn. Ew bi xwe jî mirovekî ciwan bû û her weha di wan aliyan de hunera xwe didanî ber çavên ji mirovan de. Lolan Beg jî mirovekî ku dema ciwaniyê buhurandi bû. Bi vê yekê re jî hebûna şer jî dîti bû. Ji aliyê nêzîkatiyên şer ve jî ne mirovekî ku nezan bû. Mirovekî ku zane bû. Baweriya mirov jî pê dihat. Ji ber ku mirov ew di demên zor de dîti bûn û zani bûn ku mirovekî çend xwedî huner û hêz e. Di gelek cihan de bi bavê xwe re ma bû û tiştên mazin dîti bûn. Lolan Beg û Memyan Beg di gelek rewşan de weke ku hevdu tamam dikirin dihate ber çavan.

Bedran Beg li ser hespê xwe bi gelek mirovên sereke re ku li dora wî bûn, diçû. Mirovên ku pê re hati bûn hemû jî giregir û serekê eşîran bûn. Mirovên li dora wî mirovên ku di demên zor de buhurti bû. Piraniya wan jî xwediyê zanebûneke mazin bûn. Bedran Beg li ser hespekî sipî suwar bû bû. Hespê wî hêspekî ku mahînek bû û gelekî ji hêja bû. Hespên yê mirov din yê ku weke sereke pê re hati bûn jî gelek ji wan sipî bûn. Lê yê Bedran Beg ji aliyê amadekirinê ve jî weke ku diyarbûneke wî hebû. Bedran Beg li pêşiya suwarên xwe bû û serekê eşîrên ku pê re hati bûn jî di rex de bûn û diçûn. Ji aliyekî din ve jî gava ku ji pêş ve li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku ji keviye rast û çepê ve bêhtir fireh bûn bi suwarên re dihate ber çavan. Her weha wilo dihate ber çavan ku hêrişeke di cih de bûba, wê begê xwe kiri bana nav xwe de û biparastina. Lê begek çî cari ne dixwast ku li paş bimîne li nav leşkeran. Ew jî bi leşkerên xwe re di nav zorê de cih digirt û bi wan re re şerê xwe berdewam dikir. Di wê heyamê de jî tiştê ku dihate dîtin jî ew bû ku beg li pêşiya leşkerên xwe bû hem ji bo ku xwe bide nîşandan û hem ji ji bo arîşeyên leşkerên wî bi cih bihêne. Gava ku di rewşekê de arîşe xira bû, êdî tekçûn çêdibe. Bedran Beg vê yekê weke ku zanibû li leşkerên xwe dimeyizand û wan dilxweş dikir.

Nûçe ji Lolan Begê tê ji wan re ku wê li ku derê bin û wê li ku derê daynin. Lolan Beg bi pêşeng û berîvanan re biryara xwe dide ku ka li ku derê baş e û divêt li ku derê dahênin were xuyakirin. Gava ku kifşdikin ji pêşengek ji pêşengên ku bi wî re di kifşkirinê de cih girtî jî, dikevin rê de û tîn nig Bedran Beg û serekeyên din û ji wan re dibêjin ku wê li ku derê dahênin. Hingê pêşeng tiştê ku diviya bû ku ji wan re bêjê ku got, êdî ji wê pê de ku di serê hineken de jî yê ku li wî hesandin ku tiştêk ji bo pirsbûna di serê wan de hebe ew jî

dipirsin û mejiyê xwe zelal dikin. Li herêmê û li ser cihê ku wê lê dahênin, di şeran de rewakirin çê dibe. Lolan Beg cihê ku xuya kiri bû hinekî ji Çiyayê Raz wir de bû. Bi aliyê herêma Reşîd Beg û ji Çiyayê Raz wir de cih hati bû amadekirin.

Di vê heyamê de jî divêt ku mirov bêjê Mihemed jî bi wan re keti bû rê de. Ji Mihemed re jî hespêk peyda kiri bûn û ew jî suwar bûbû û bi wan re ketibû rê de. Hespê ku Mihemed li ser suwar bû di rex Bedran Begê de diçû. Lê gava ku lê dihate meyizandin, weke bêhtir ne bi kêf bû ku li ser hespê suwar bû bû. Wî hez ji peyaçûn-û hatinê dikir. Lê rewşa wan jî ne rewşa Mele Seîd bû ku piyade herin. Ji ber vê yekê jî ew ji li ser hespek bû suwar bû û bi wan re keti bû rê de.

Lolan Beg li pêşiya wan û li ser serê leşkerên xwe diçû. Lolan Beg gava ku ber bi Çiyayê Raz ve têt, Dîlberê têt hişê wî di wê heyamê de. Dîlberê li ser wî çiyayi dima bi kul, bi elem û bi wan êşên gran ên di dilê xwe de. Mihemed jî hinekî bi dilper bû di çûna li nêzîkiya çiyê. Dîlberê hîç ji mejiyê wî ne derdiket. Di her kêlîkê de li ser wê dihizirî û dihizirî. Dîlberê li ser wî gelekî bandûreke mazin kiri bû. Dîlberê li ser serê Çiyayê Raz dima. Lê ew ji wê cihê ku lê maba ji çiyê wirde bû. Lolan Beg pêşîkê têt ber çiyê dike ku xwe bigehene wê di wê heyamê de. Lê gava ku diçe ew wê nabine. Hinek mirov jî li wir dihêle da ku li wê bigerin û wê bibînin. Ew bi xwe jî diviya bû ku li pêşiya suwarên xwe be ji bo ku cih ji yên ku wê werin re hati ba amade kirin. Lolan Beg bi suwarên xwe re dikeve wê herêmê de êdî bi suwarên xwe re dest bi girtina ewlakariyê dike. Gava Lolan Beg bi suwarên xwe re dikeve herêmê de û ewlakariya herêmê ji bo Bedran Beg û leşkerên ku wê werin digire û cih ji wan re amade dike, êdî ew jî dike ku ber bi Çiyayê Raz ve vegere. Lê pêşegek wî

dide rawestandin ji ber ku diviya bû ku ewlakarî bihatina girtin û sehêtkirin li ser herêmê hati ba avakirin. Ji bo vê yekê jî diviya bû ku ew li ser serê suwarên xwe ba, da ku sehêtkirin hati ba kirin. Lê hizra wî ji li ser Çiyayê Raz bû û li ser Dîlberê bû.

Dîlberê li ser serê çiyê bû. Gava ku ew hati bûn jî di cihê xwe de wê ew dîtî ku dihatin. Lê di xwe de ne didît ku here nig wan. Rewşa ku ew te de bû rewşeke gelekî xirab bû. Cilên li ser wê qetiyayî bûn. Laşê wê ji di çilê wê de dihate xuyakirin. Wê çawa derketiba pêşiya wan? Wê ew rû di xwe de ne didît. Gava ku dibîne ku ew dihên, dilopên hêsiran ji çavên wê de dikeîn ser kabûkên wê de. Gelekî bihest dibe. Di dilê xwe de dixwaze ku ji xwe re bigirî û digirî. Lê bi xwe re weke ku şer fikir da ku xwe bigire, da ku deng ji wê ne derkeve. Di wê heyamê de xwegirtin gelekî jê re zor dihat. Gava ku wê ew dîtî bûn, jiyana wê ya berê qat bi qat di ber çavên wê de çû û çû. Jiyana ku berê jiya bû bi Dilşadî re, hatina suwarên ji bo şer û rewşa wê ya di wê kêlîkê de ew tê de bû. Çi kiri ba ji ev her sê rewş li ber çavên wê ne diçûn. Ew her sê rewşên ku gelekî êş didanê de. Wê çawa derketi ba ber çavên mirovan? Ew bi xwe jî li jorê wan bû. Hêdî hêdî ew jî ber bi jorê ve diçûn. Gava ku didît ku ew hêdî hêdî ber bi jorê ve dihên, dilperiya wê ya ku di dilê wê de bêhtir dibû. Wê xwe di nav hajên daran de veşartî bû.

Hêdî hêdî komên şervanên din jî, ji ser aliyê çiyê ve derdiketin û ber bi koma Lolan Begê ve diçûn. Çend kom bêhtir dihatin wê ji fahm fikir ku wê hê koma şervanên herî mazin were. Bi hev re weke artêşeke gelekî mazin dihatine xuyakirin. Piştî ku hinek komên biçûk hatin, êdî Dîlberê ji dûr ve dît ku artêş wa ber bi wê ve têt. Gava ku hê dûr bûn û her weha li wan dihate meyizandin, dihate dîtî ku mirov digot qey komên mirovên girtine erdê û dihên. Gelek mirov



ji dûr ve dihatine xuyakirin. Lê wan jî dilê Dîlberê rehet ne dikir. Ma gelo wê ev kari ba ku Dilşad sax bike, vejîne û bihêne hevberê wê? Ev yek ne gengaz bû. Lê ji vê yekê dihate têgehîştin ku hê Dîlberê çûna Dilşad herê ne kiri bû. Dilşad hê di serê wê de weke berê mabû. Wê car bi car gava ku dihizirî digot; 'a ha wê nuha Dilşad wa li hevberê min be'. Carina jî weke ku li hevberê wê be li wê dihat. Lê dimeyizand û dimeyizand. Dilşad jî her weha di dîtina wê de lê dimeyizand. Dilşad gava ku di Newrozê de ew dîtî bû, her weha hema li wê bi ken meyizandi bû. Di wê kêlîkê de jî weke ku li hevberê wê be û lê bimeyizêne û bi ken lê dihat. Her weha gava ku wilo li wê dihat, ku ew li hevberê wê ye û li wê dimeyizêne, êdî wê jî wilo li wî dimeyizand. Wê gava ku ew di dîtina xwe de rûken didît, wê jî dixwast ku bikene. Lê ne dikenî. Ni karî bû ku bikene. Weke ku di hundurê wê de tiştêkî ne dihêşt ku ew bikene. Gava weke ku ew didît wilo li wê dihat, wê digot qey laşê wê tevizî be. Çawa ku marek hê serê sibehê bitevize û her weha ji ber wê tavzê ku ni kari bû lebat bikira, ew jî wilo tevizî bû. Wê ne kiri bû bikene. Ku hewlê dida xwe bi vî awayî re bersiva bi ken bide Dilşadî. Lê ni kari bû, qirika wê tijî dibû û di qirika wê de dima. Wê tijîbûna wê ne dihêşt ku ew bikene. Ne dihêşt ku wan lêvên xwe yên ku sor bû bûn, bigehîne hevdu. Dîlberê li dunya xwe her weha dijiya. Li dunya wê hê Dilşad bi wê re bû û bi wê re dikenî. Wê jî bi wî re dixwast bikene, lê ne dikenî. Çima? Wê di hundurê xwe de Dilşadî di jînê de hiştî bû. Ew hiştin bû ku dikir ku ew bi hev re dikenî. Lê çima wê ni kari bû ku bikene? Kenkirin carina çend zor e. Carina bi êş dike. Ken ji şahiyê dihêt. Gava ku wê ew didît ne dikari bû bikene? Ew ken ji ber ku ne ken bû. Ew ken girî bû. Ew ken giriyê dil bû. Dîlberê di dilê xwe de her dem dikir girî. Ta ku sax be, wê her û her kenekî ku giriya dilê wê

bide derve wê hebe. Girîna dil wê her dem xwe li nig wê bijiyanda. Dil digirî. Dilê digirî jî dilê Dîlberê bû. Dilgirîn bi xwe re zivistana jiyane dihêne. Gava ku giri bû wî çaxî jî serma û elema zivistanê di dilê wê de hebû. Di dilê Dîlberê de serma û elemek hebû. Ew serma û elem bi wê re bû bû kelem. Dîlberê dil bi kul bû, elema di dilê xwe de win bû bû. Gava ku suwarên ku dihatin wê her hê bêhtir ji xwe ve biri bû. Ji ber ku weke ku bi rastiyeke re rû bi rû bihata lê dihat. Gelo ew rastî jî çî bû ku wê her wisan ditirsand? Rastiya ku di ser û dilê xwe de herê ne kiri bû. Bi vê yekê re weke ku ne dixwast, ku wan bibîne. Lê wan jî ber bi wê ve dihatin û dihatin.

Hêza mazin ya ku Bedran Beg li ser serê wê ye hêdî hêdî dihat. Dîlberê li cihê xwe ye ku rûniştî bû hatina wan didît. Hema wilo di cihê xwe de rûniştibû û li hatina wan dimeyizand. Dihatinê de çend ku nêzîk dibûn û ber bi wê ve dihatin. Lê Dîlberê wêra ne dikir ku derkeve pêşiya wan û xwe şanî wan bide. Dîlberê ji wan bêhtir ne dût bû. Dengê xwe kiri bana, dibit ku wan wê dengên wê seh jî kiri bana. Lê di xwe de ne didît ku derkeve holê û here nig wan. Ji aliyekî din ve jî weke ku ne dixwast ku ji wir biqete û here. Wilo li wê dihat ku ji wir çûba wê ji Dilşad jî qut bûba. Dibit ku sedemeke ku di dilê wê de ye, ew jî ew yek bû, ku wê ji wir ne dikir. Ew demeke dirêj bû ku li wir bû. Li wir di her kêlîkê de Dilşad di serê wê de bi wê re û li nig wê bû. Ditirsiya jî ku ji wir çûba wê ew dîtînen wê li wir maba. Her weha wê ne dixwast ku ji wan dîtînen xwe veqete û here. Wê ne dixwast, ku tiştên ku didîtin û dihatine ber çavên wê de ji wan biqarehe û here. Her weha ew çiya jê re bûbû weke malekê. Çiyayê Raz di razbûna xwe de weke ku tişteke veşarti be û ew jî bi wî tiştî ve girêdayî be. Dêşt û çolên ku li ber çavên wê dihatine xuyakirin jî, weke ku wê bi dîtina xwe ve girêdabûn lê dihat. Wê çawa ji wir

vegetiya ba? Evîna wê ya ku di dilê wê de li wir weke ku li wê derê xwe dijiyand, bi wate kiri bû. Bi vê yekê re ne dixwast, ku ji wir biqarehe û here. Ne dixwast ku ji evîna xwe her weha biqarehe û here. Evîn di dilê wê de bû û evînek jîndar bû. Her dem jî di dil de wê xwe vejanda. Evîn di dil de hebûneke xwe çê dike û dide vejîn. Her weha evîn di jiyane de bi çendî ku dijî, wê ewçend jî bijiya. Evîna di dilê Dîlberê de jî her weha vejîya bû û ev evîn bû wê dida jiyandin. Jiyanê wê qenc bi xwe ve girê dabû û ne dibe da, da ku bimêne di vejîne de. Her weha ji ber vê yekê bû ku Dîlberê li wir bi hebûna wê re girêdayî bûbû. Dîlberê gava ku hatina suwaran didît û hilkişîna mirovan ku ber bi çiya ve dihatine jor, di hundurê xwe de her weha pê dihêşiya. Her ku pê dihêşiya jî, weke diviya bû ku xwe bida ber bi paş ve û ji wan baz bide, lê dihat. Dîlberê çend hatina suwaran ku bêhtir didît, hem dilperîn û hem ji hestbûna wê pê re bêhtir dibû.

Gava ku hêza mazin nêzîk dibe, Dîlberê dibîne ku wa Bedran Beg jî li pêşiya wan suwaran û li ser piştê hespê xwe ve têt. Birayê wê Memyan Beg jî di rex de ye li ser hespê ye û ber bi wê ve têt. Ji ewca baniya çiyê ew pir xweş didîtin. Dîlberê her weha gava ku ewdîtin qirika wê tijî dibû. Di wê heyamê de jî mirovên ku li wê digeriyan jî bi çiyê de dihilkişiyên ber bi jor de. Dîlberê ewna jî pir baş û qenc didît. Dîlberê ku dengê xwe kiri ba wê seh kiri bana. Lê dengê xwe ne derdixist. Ta ku jê jî dihat, nedîhişt ku dengê wê derkeve, da ku ewên ku hatine nêzîkê wê, da ku hişê dengê wê ne kin.

Bedran Beg û Memyan Beg li ser hespên xwe li pêşiya suwaran di ber wê de diçûn, di wê heyamê de Dîlberê dît ku Mihemed jî wa ye li ser hespekî ye û di rex wan de ye û diçe. Dîlberê gava ku ew dît, her weha wê kêlîkê li wî jî meyizand. Mihemed jî hati bû bi wan re. Wî dikari bû ku carekê di ne yê wir. Lê hati bû. Dibit ku di dilê

xwe de xwasti bû ku careke dî jî wê bidîta. Ma ka Dîlberê dixwast ku xwe şanî wan bide? Dîlberê li wir di rewşa xwe de bi tenê û bêdeng, hema wilo li wan dimeyizand. Ew jî hema wilo ji wê bêxeber ku li wê derê dimeyizandin, di nig wê de dibuhurtin û diçûn. Dîlberê ji dûr ve gava li cihê ku Li wê bisekinin, dimeyizand didît ku hin bi hin pir dibûn. Dîlberê tiştê ku dibû di wê kêlîkê de didît. Ew jî bi hebûna xwe re li ber çavên wê bûn, lê ji wê nehaydar û bêxeber.. Dîlberê xwe şanî wan ne dida da ku wê bibînen. Dîlberê xwe şanî wan nedida, ji ber ku ditirsiya, ku wê ji evîna xwe ya ku li wê derê di dilê xwe de bi cih kiri bû wê dûrkeve. Wê jî çî carî ne dixwast ku ev yekê bibe. Her weha tenê dixwast bi evîna xwe re bijî û her dem li nig hevdu bin.

Di wê heyamê de li aliyê Reşîd Beg jî pê heseha bûn ku Bedran Beg bi hêza xwe re hatiye ser wan de. Ew jî li hev kombû bûn û guftûgo dikirin ku ka ma wê çî bikin. Gava ku li hev digehin û guftugo dikirin, digotin ku tiştê ku Reşîd Beg kirî, ne rast bû. Di wê heyamê de jî serekên eşîran piştî ku ew rewş bûbû êdî di nav xwe de yek ji xwe kiri bûn serekê eşîrê û Reşîd Beg bêbandûr kiri bûn. Reşîd Beg êdî weke mirovê ku di nav wan de rûnihê û ji wan re bipeyive ne dihate dîtin. Li gor kevneşopiyan diviya bû ku Reşîd Beg bêceza ne hati ba hiştin. Lê ta wê kêlîkê jî hê Reşîd Beg sax bû û li wir bû. Lê ji aliyê serekên eşîran ve bêbandûr hati bû hiştin. Serekên eşîran, gava ku li hev digîhenin û rewşê guftûgo dikin, di wê heyamê de Reşîd Beg jî dikin di bin ewlekariyê de, da ku ji wê derê ne çî çî dernên din. Serekên eşîra gava ku li hev digehînin, li ser rewşê dipeyivin. Lê berî ku lihevdu rûnihên jî, hinek berevan û pêşengên şandi bûn, ku li rewşê meyizênin û werin ji wan re bibejin ku ka ma rewşa wan çawa ye. Di wê heyama rûniştinê de berevan û

pêşengên wan dihên û rewşa ku dîtî ji wan re seranser dibêjin. Ew jî gava ku hatina Bedran Beg dibihîzin, fêhm dikin rewşa tê de ne, giran e û şer jî di navbera wan de çê bibe, wê gelek mirov werin kuştin û ziyanên wan wê bibin. Ji aliyekî din ve jî ku şer bûba wê şerekî, ku şerê birakujî ba. Ev wê rewşeke gelekî giran bihaniya ji wan re.

Silo Axa mirovekî ku gelekî zane dihate naskirin. Wî li dora xwe gelek mirovên ku zanistvan bûn, dabûn hevdu û bi wan re dişewirî. Her weha di nav xelkê de jî navê şewirmendên Silo Axa derketi bû. Ji aliyekî di ve ji şewirmendên wî hemûken ji mirov ku gelekî di nav xelkê de bi bandûr bûn û di nav xelkê de jî xwediye rêzeke mazin bûn. Piştî ku Silo Axa dimire, êdî weke ku cihê wî dimîne vala, wisan li xelkê dihat. Lê şewirmendên wî weke ku di dema wî de çawa bûn, piştî wî re jî, her weha hebûna xwe berdewam kiri bûn. Lê herême jî ji ber ku di ber çavan de bû, di çî demekê de jî pirsgirêkên wê hew ne dibûn. Osmaniyên bela xwe ji wan ne divekir. Gelekî jî diçûnen ser wan de. Ji ber vê yekê bû ku Mîrzan Beg hati bû şandin nig Mîrê Bota. Hê Mîrê Bota dema ku Silo Axa sax bû, herdûkan gelekî bi ser hevdu de diçûn. Gelek caran Silo Axa çû bû nig Mîrê Bota. Ji ber vê yekê jî Mîrê Bota li Mîrzan Beg xwedî derketi bû. Piştî ku Mîrzan Beg diçe nig Mîrê Bota, êdî osmanî hinek nêzîkatiyên xwe paş ve kişandi bûn. Dema ku Silo Axa koçê dawiyê kir û Mîrzan Beg jî bi tene mabû û di diçûn ser herême de. Lê piştî ku Mîrzan Beg diçe nig Mîrê Bota, êdî çûna ser wan weke berê na be. Hebûna Mîrê Bota her weha xwediye bandûrake mazin bû. Piştî ku Silo Axa koç dike û Mîrzan Beg jî bi tene dimîne êdî Osmaniyên ji gelekî çûbûn ser wî de. Mîrzan Beg mirov ku bi kevneşopiyên xwe ve girêdayî bû. Bavê wî gava ku hê ew piçûk bû ew danibû nig seydayên da ku mazin fer

bi be. Her weha bi wî re kêşaneyekê ku xwedî zanebûn ji bû hebû. Serekên eşîrê gava ku Mîrzan Beg çûbû nig Mîrê Bota êdî kar û bare eşîrê wan dikir. Gava ku Mîrzan Beg diçe, êdî Reşîd Beg ji li dewsa bavê xwe dirûne û xelk jî bi vê yadgariyê rêz didiyê de. Sedema ku rêz didanê, hem kurê Silo Axa bû û hem jî di cihê wî de dirûnişt, ji ber vê yekê bû. Wan herdu sedeman her weha ji wî re rêzbûnek mazin dabû avakirin. Wî jî bi vê yekê re weke ku xwe winda bike lê hati bû. Berî wê demê jî çend tiştên ku dikirin, mirov digotin kurê Silo Axa ye û tişteke jê re ne digotin. Lê piştî wê rewşê ku bi Dilşad û Dîlberê re rû da, êdî mirov li hevberên wî rawestan. Mirov ev yek li gor kevneşopiyên xwe weke berêzeke mazin dipejirandin. Di rastiye de her weha ew yekê li hevberê kevneşopiyên civakê, gelekî berêziyeke mazin bû. Wê rewşê di ser û dilê mirov de gelekî êşeke mazin çê kiri bû. Gava ku serekên eşîran her weha vê yekê dibînien, dikin ku wî bêbandûr bikin. Piştî ku wî bêbandûr dikin, ji aliyê xelkê ve jî nêzîkatiyeke herênî dibinin û êdî ew jî her weha bi xwe re rewşa serokatiya eşîran bi rê ve dibin.

Lê Rewşa Dilşad û Dîlberê Li herêmên hemûkan jî hati bû zanîn û mirov jî gava ku dibihîstin, gelekî qahra xwe jî dihanîn ser zimên. Tişteke ku bi Dilşad û Dîlberê re bû bû, gelekî û gelekî bêrêz didîtin. Weke bêrêzkirineke mazin dijimartin. Her weha bi bihîstina Şerê Bedran Beg re êdî rewş bûbû rewşeke çivakî di qada xwe de. Mirov pir jê dipeyivîn û li ser hizirên xwe digotin. Lê gava ku mirov bûyer dihanîn bîra xwe jî pê gelekî biêş dibûn. Ev rûdan li hevberî toreya bicih bû. Derveyî kirinên civatê bû. Nêzîkatiyên evîndariyê di çanda ciwanî û ya civakê de xwediyê hinek taybetmendiyan hûneri yên mazin bû. Di şahiyên weke şahiyên Newrozan de jî wan nêzîkatiyên taybetmendiyan xwe weke taybetmendiyan çanda bingehîn

dihanîn ser zimên. Mirov her weha bi vê çanda civakê re nêzîkatiyên xwe dihanîne ser zimên û ew bûyer di vê temenê de weke bêrêziyeke mazin li hevberê civakê didîtin. Di vir de hêjayê gotinê ye ku divêt mirov bêjê ku çivaknasiya civakê pir mazin û peşketî bû. Ji aliyê hizir û hestiyar ve pir pêşketî bû. Ji lew re civaka wan, civaka herî kevin a cîhanê bû. Ji ber vê yekê ve jî ev rewş her weha bandûreke mazin dida nîşandan li ser mirovên vê civata kevin a xwedî kevneşopiyên serteserî û ebediyetê.

Piştî ku hêza ku bi Bedran Beg re hati bû, êdî hemû civata leşker liser girtî jî li cihê bûnû ji xwe re li ser riyeke çareseriyê dihizirîn. Serekên eşîra wan jî li çend roj bû li ser hev civiya bûn û guftûgo dikirin ku ka ma çi dikari bûn bikin. Di wê heyamê de jî hêze Bedran Beg hati bû nêzî wan danî bû. Di nav xelkê de jî çûn û hatin bêhtir bû bû. Herkesek dihizirî ku ka ma wê çi bibe. Lê çi hizra yekî jî, ji wan ne bû. Herkesekî digotin êdî çi kesekî ni kari bû ku pêşî li vê bigire. Wê şer bibûna. Lê ku şer jî bibûna êdî wê gelek windabûn jî ji wan re çê bûna. Rastî her weha bû. Bêguman ku şer çêbibûna wê gelek windabûn çêbibûna. Vê yekê serekên eşîrê jî dizani bûn û dizani bûn, ku ji çi kesekî ne dixwast, ku ji bo tiştê her weha şer bikirana. Mirov ev kirina Reşîd Begê tiştê pir xirap û wek bêrûmetiyekê didîtin û ne dixwastin ku ji bo vê yekê şer bikin. Di vê rewşê de ku şer qewimî ba û mirov keti ba şer wê zor jî bûba. Ji ber ku her weha derûniya mirov di zorê de bû û ji aliyê din ve jî hêza Bedran Beg pir mazin bû. Li ser vê yekê jî serekên eşîran dihizirîn ku ka ma wê çi bikin.

Di dawiyê de biryara xwe didin ku ji nav xwe hinek mirovên ku serekên binemal<sup>n</sup> mazin bişênin da ku bi Bedran Beg re hevdîtinê çêbikin. Gava ku serekên eşîran li hevdu civiya bûn ku ka ma wê çi

bikin, di guftûugoyan de hîç gotin li ser Reşîd Beg ne hati bû. Weke ku hebûna Reşîd Beg ne be tevdigeriyan û biryarên xwe dabûn. Lê gava ku guftûgo bû di hundurê guftûgoyan de hinekên ji wan serekeyan digotin ku divêt Reşo Axa bêceza ne mîne. Lê ji ber ku ew kurê axayê wan bû, ku êdî herkesekê gava ku vê hizra xwe digotin, hinekî jî dihizirîn û digotin. Li dawiyê gava ku biryara xwe dabûn, êdî Goti bûn ku em serê xwe ji wî na êşînin û hwd. Piştî wê yekê ku biryara xwe didin û hinek mirov ji nav xwe ji diyar dikin ku bişînin da ku bi Bedran Beg re hevdîtîne bikin, êdî pişt re civîna xwe bi dawiyê dihênin. Dikevin ser rê de û dikin ku herin nig Bedran Beg, da ku pê re hevdîtina çê bikin.

Di wê heyamê de Reşo Axa jî hati bû girtin û keti bû di bin çavan de. Reşo Axa çî gotiba û ne gotiba êdî gotina xwe ne dida herêkirin bi wan mirovên ku serek bûn. Mirov êdî guh ne dida wî. Gava ku dîtî bûn çî çareserî jê re ne maye, êdî ew jî biryara xwe dide ku ji wir bireve û here. Lê ka ma wê ev yekê çawa kiri bana? Ew jî êdî ku çareserî ji xwe re wekî din ne dît, êdî ji xwe re çareyek din dît ku xwe bikuje û ruhê xwe bi destê xwe hew bike. Ew bi xwe jî hati bû xistin di odeyekê de û li devê derî ji yên ku lê agehdar bûbûn hati bûn rawestandin. Her serê kêlîkekê jî hinek ji mirovên serekê jî dihatin û li wî dimeyizandin. Cihê ku ew kiri bûnê de ji aliyê ewlakariyê ve cihekî ku gelekî baş bû. Lê jê re nabe zor ku mirovên ku li devê derî bûn bihêne rê û ji wir derkeve û here. Ji ber ku ew hîna jî kurê axê wan bû û mirov jî her weha ji wî saw digirtin. Wî jî vê yekê zanibû ku sawa wî li ser mirovan hebû. Bi vê yekê re dibake yên ku ji bo wî li devê derî rawestane û bi wan re dipeyive, da ku wan qanih bike. Bi axiftinê re sawê xwe û tirsê ku ji wê sawa wî çêdibû, jê re dibe weke heval û ew wan pawanan bi vê yekê re



dihêne rê li gor xwe di wê kêlîkê de. Gava ku ew dihên rê, êdî ji wir derdikeve û bi bal xwe digehîne tewla mehînan yan ji cahnûkan ku ji wir hespekî ku derbixe û lê suwar be û ji wir dûrbikeve û here xwe jiyana xwe li derve hew bike. Di tewlê de li hespekî geriya bû lê ne dîtî bû. Tenê mehînek bi dest wî keti bû. Kiri bû ku xwe bigihêne hespekî û lê suwar bibe û ji wir here. Lê tenê kari bû xwe bigehîne mehînekî. Hesp gava ku pîr dibe, dibe mehin. Mehîn jî loma bêhtir ne bezek e. Lê ne bêbeza bû. Reşo Axa têne ew mehîn dîtî bû û li wê mehîne suwar bû û dabû ser rê de. Mehîn çend baz dida jî, ji beza mirov bêhtir baz ne dida yan jî piçekî jê bêhtir diçû. Gava ku li mehîne suwar dibe, êdî dide devê hawşa malê û ji wir dike ku derkeve û here. Ma gelo wê çûba ku derê? Ki ye wî hawandiba? Ew bi xwe jî li ser vê xalê bêhizir bû. Lê diçû. Tirs canê wî keti bû dilê wî de û ew dibir ji wir. Tirs di mirov de tiştê ku neke jî dide kirin. Gava ku ji malê derdikeve û dikeve nav malan de ji na hêle ku mirov wî bibînin. Lê mirov ku wî dibinin ji bi çavan matmayî lê dimeyizênin. Hem jî ew li mehînekê suwar bû bû. Her weha çawa dike, xwe ji navendê derdixe. Dem jî êvar e. Lê ji tavahêyve bêhtir ne reş e. Gava ku tê ber kenarê navendê ji aliyê derve êdî dike ku bide mehinê ku bi bez here, lê mehîn wê çend bazdêne ku! Ku hinekî ji wir dûr ketiba heye ku rizgar bûba. Ku hinekî ji navendê dike ku dûrkeve ji aliyê hinek şervanan ve têt kifşkirin. Leşkerên ku wî kifş dikin jî leşkerê Nîge Beg bûn. Leşkerên Nîge Beg jî hinekî ji Bedran Beg wirde bi cih bûbûn. Ji aliyê xwe ve her weha hêza Nîge Beg aliyê ku lê bû baş û mazin kiri bû bû bin ewlekariyê xwe de. Navend jî di bin çavên hêzên eşîra Silo Axa de bûn. Ji wî aliyê ve ku Reşo Axa kiri bana ku çûba, wê di cih de hati ba kifşkirin. Ji ber vê yekê jî, kiri bû ku di keviyê de, di navbera herdu hêzan de çûba û

xwe rizgar kiri ba. Gava ku leşkerên Nîge Beg wî kifş dikin bi dengêkî ku hinekî bilind di bakirinê de ji bo ku wî bibînen ku ka ma kî ye. Ji dûrî ve jî ne weke leşkerekî dihate xuyakirin. Ji ber vê yekê ji bêhtir leşkerê ku ew dîti bûn li ser ne sekinî bûn. Tenê xwasti bûn ku ruyê wî bibînin û jê bigerin û here. Lêşker têt û wî dide rawestandî, te nig wî û lê dimeyizêne û gava ku bêjiyê de êdî here bi riya xwe de. Leşkerekî din ku li wî dimeyizêne fêhm na ke ku ew Reşo Axa e. Lê gava ku lêşker dev jê digere êdî ew jî dide mehîna xwe ji wir here. Hinek leşkerên din dikevin gumanan de û dixwazin carekê din wî bidin rawestandî. Reşo Axa weke mirovekî asayî be, tevdgiriya gava ku ew leşkerên din jî ew dibînin. Lê Leşkerên ku têne nig wî carekê din wî ji Mehine wî paya dikin. Gava leşkerên dixwazin ku ew peya bibe û bi vê yekê re di ruyê wî de tirs digire êdî. Leşker hê bêhtir bi xwastek dibin ku wî peya kin. Ew jî gava ku dibêjine 'de peya be!' fêhm dike ku ew hat naskirin û dide mehîna xwe ku baz bide. Lê gava ku dike ku baz bide êdî hinek leşkerên din xwe digehininê de û ewan leşker bi carekê re xwe diavajine hafserên mehîne û wî peya dikin. Lê hê jî fahm ne kirine ku ew Reşo Axa e. Gava ku wî peya dikin leşker hinek pirsên bi qehr jê dikin û bi ser wî re dixûrihên û diçin. Ew jî dibêjê 'divêt ku ez xwe bigihênime mala xwe ji bo ku mitala min ne kin'. Ev gotina wî ji leşkeran re bêloçik na yê. Lê li wî bi hers bûn di wê kêlîkê de. Gava ku leşker dibêjinê 'li Mehina xwe suwar bibe û here!' êdî ew jî bi lezê dike ku li mehîna xwe suwar bibe û here. Di nav vê çûn û hatinê de, hinek leşkerên din jî li xwe wan digehînin û bi ser wan de kom dibin. Di wê heyamê de jî serekek ku li nig Nîge Beg rawestayê ber bi wan ve têt, ku meyizênin ka çi bûye. Gava ku ew ber bi wan ve têt, di wê heyamê de jî Reşo Axa dike ku li mehîna xwe suwar be û here ji wir û rizgar

be. Gava ku ew lingê xwe diavêje ser zenguyê mehînê û lê suwar dibe û berê mehînê dizivîne ku here serleşker dibake leşkeran; 'wî rawestînin!' Gava ku her weha deng diçe gehê Reşo Axa, êdî Reşo Axa dikeve tirsê ne radiweste û dilezêne ku here ji wir. Leşker dîsan wî didine rawestandî. Gava ku yê sereke xwe digehîne wî nas dike kî ye û dibêjê: 'Kuro wî ne berdin, ew Reşo ye!' Gava ku yê sereke her weha vê yekê dibêje, bi gotinê re leşker xwe diavêjine ser klaxê wî de. Yê sereke ku digehê dahma wî, êdî dibêjiyê de: 'Hey xirabo! Ma tu çawa rizgar bî ji destê min?!' Gava ku têt naskirin kî ye û leşker wî digirin serek jî digehîje wî û biderbehêzeke bi wî dikeve û dest bi lêxistina wî dike. Reşo Axa di destên wan de bû û kutanê dixwar ji destê serleşkerê de. Ev nûçe zû digihê Nîge Begî. Gava ku Nîge Beg jî têt wir û ew lê na xe û dibêje bigrin û bihênin. Reşo Axa di wê heyamê de têne destê xwe dida ser serê xwe daku xwe ji derbên ku têne bipareze. Ji wê pê ve destê xwe ne dide ber xwe di wê heyamê de. Nîge Beg ji leşkeran re dibêjê wî sax bihêlin ta ku em wî bibine nig Bedran Begî. Bi vê gotina Nîge Beg re êdî wî digirin û dibin nig Bedran Beg. Di wê heyamê de hinek dengê qêrîn û hawar ji aliyê çiyê ve tîn. Nîge Beg û serekên ku pê re ne, bala wan diçe ser wan dangan dixwazin fahmkin ka ji bo çi ye. Hinek sereke û hinek leşker Reşo Axaê girtî li pêşiya wan e diçin. Gava ku diçin ber bi çiyê ve û hinekî nêzîk jî dibin êdî dengên ku dihêne wan ber bi zelalbûnê ve diçin. Lê hê jî bi yekcarî na yêt têgehîştin ku ka ma ji ber çi ew deng dihên. Gava ku Nîge Beg û yên ku pê re ne fêhm dikin, êdî hê bêhtir bi rêveçûna xwe re dilezênin û ber bi çiyê ve diçin. Nîge Beg fêhm dike ku Dîlberê hatiye dîtin. Her weha gava ku ew fêhm dike ku Dîlberê hatiye dîtin, êdî ew ji bi kêf dibêjê: 'Begê min! Dîlberê hatiye dîtin, Dîlberê dîtinea!' Gava ku Nîge Beg her

weha vê yekê seh dike bi gavên bezê re dike ku here ber bi çiyê ve. Gava ku diçe û dibîne ku bi rastî jî wa ye Dîlberê hatiye dîtî pir dilxweş dibe. Lê gelek hestewar jî dibe gava ew rewşa wê ya xirab dibîne. Nîge Beg gava ku Dîlberê dibîne her weha êdî weke ku hinekî dilê wî ji tijî bûbe lê têt. Lê Nîge Beg weke ku bixwaze xwe bigire bi xwe re tevdigere. Dîsan ew tijîbûna wî baş dihate têgehîştin ji aliyê mirovên ku li dora wî bûn.

Nîge Beg gava dibîne ku bi rastî jî wa Dîlberê hatî dîtî, dilxweşiyêke mazin pê re çê dibe. Li hevberê rewşa wê ye ku dihate dîtî jî, wî xwe ne girti bû û tijîbû bû. Gava xwe digehîninê, li hevberê wê rawesta li ruyê wê meyizand. Gava ku li ruyê wê meyizand, di wê de weke qaramên wî bişkên lê hat. Mirovên ku ew dîtî bûn, bi çendî ku bi dîtîna wê dilxweş bûbûn, ewçend jî bi dîtîna wê dilperitî jî bû bûn.

Dîlberê di rewş û dîtîna xwe de gelekî hati bû guherandin. Mirovê ku lê dimeyizandin, ev yekê pir baş û mazin fêhm dikirin. Yê ku lê dimeyizandin jî çavên xwe jê ne digirtin û her weha hema wilo lê dimeyizandin di wê heyamê de. Gava ku dest bi hanîna Dîlberê ya nig Bedran Beg kiri bûn, di rê de ku diçûn, di nav destên mirov de bi çavên biêş û mat li dora xwe dimeyizand. Mirov ku ew didîtî jî, her weha bi wan çavan li wê dimeyizandin. Di hanîna de pêşîkê ew ne birin nig Bedran Beg. Pêşîkê ew birin û kirine konekî, ku ji bo wê hati bû amadekirin. Lê di wê heyamê de jî, Reşo Axa ji dihate birin ku bibin nig Bedran Beg. Di rê de jî gava ku dihate birin mirovên ku ew dibirin dev ji wî û derbehêzkan ne diberdan. Ji kêlîkê ku Reşo Axa hati bû girtin û ta wê kêlîkê ji derbehêzkên li wî rizgar ne bû bûn. Mirovên ku ew ne dîtî bûn ji tiştê ku wî kirî ku seh kiri bûn, gelekî jê hers bû bûn. Gava ku ew dîtî bûn jî, her weha ew

hersbûna xwe wan jî dihanîne ser zimên bi wan derbehêzkan re ku lê dixistinê. Bi vê yekê re, çi kesekî jî ne digot ku lê ne xin. Mirov her weha di serên xwe de xwediyê sedemên mazin bûn ji bo ku lê xin. Lê çi jê jî, bi kirinên ji dilê wan rehet ne dibû. Çi jê jî hati ba kirin dîsan dilê mirov rehet ne dikir. Ma çi hati ba kirin, wê rewşa berê hebû bi xwe re bihaniya? Bêguman ne dihanî. Êşa ku wî dabû çêkirin û xistî dilê mirovan, wê di dilê mirovan de tim û tim maba.

Bedran Beg di bin konê ku ji bo wî û serekan hati bû vegirtin de bû û guftûgo dikir di wê heyamê de. Gava ku pêşîkê çawa Reşo Axa têt girtin ji cihê ku ew têt girtin ve hinek mirov baz didin ku werin xeberê bidine Bedran Begê. Di wê heyamê de Dîlberê jî têt dîtin. Nîge Beg gava ku diçe nig Dîlberê û wê têne bin kon, êdî li derekî na mîne ta ku têt nig Bedran Begî. Nîge Beg gava ku têt û dikeve di bin kon de, di wê heyamê de ye ku nûçeya girtina Reşo Axa jî jê re hanî bûn. Gava ku Nîge Beg dikeve bin kon de, gelekî bêhna wî bi ser dilê wî keti bû. Bi wê rewşê re li hevberê Bedran Beg diraweste. Gava ku çawa ku Nîge Beg dikeve hundurê kon de bi ketine xwe re dibêjê Dîlberê. Her weha pêşîkê tenê bêjê navê Dîlberê ji nav lêvên wî derdikeve. Bala Bedran Beg çûbû ser Nîge Beg. Nîge Beg jî gava ku hati bû hevberê wî, di serî de ji bêhnçikandinê ni karî bû bipeyive. Lê gava ku keti bû hundurê de û li hevberê Bedran Beg jî rûbirû bûbû, dikir ku bipeyive lê hinekî jê re dijwar dihat. Nîge Beg ji behnçikandinê, weke ku lal bibe lê hatî bû. Di serî de kiri bû ne kiri bû ni dikari bû bipeyive. Gava ku dipeyivî jî têne gotina ku ji devê wî derketi bû; 'Dîlberê hat dîtin!' bû. Piştî ku Nîge Beg ev yekê Goti bû ji Bedran Beg re Bedran Beg ji gelekî pê bi kêfxweş bû bû. Di wê heyamê de jî yê ku hati bû ku ji beg re bêjê ku Reşo Axa jî hatiye girtin, wî jî dest bi axiftinê kir û her weha jê re got: 'Begê min, Reşo

hat girtin'. Bedran Beg gava ku vê seh kir hê bêhtir dilxweş bû bû. Di wê heyamê de wî jî xwast ku here û Dîlberê bibîne. Ji cihê xwe rabû ku here û wê bibîne. Lê serekek gotiyê: 'Begê min, hûn nuha rawestin wê baş be. Ji ber ku nuha wê kirine bin kon de û paqij dikin.' Lê Bedran Beg ne xwast ku bimîne. Bi gavên ku hinekî zû re berê xwe da devê konê û derket çû ku here nig wê û wê bibîne. Gava ku çû rast û rast çû û kete bin konê, ku Dîlberê hati bû xistin di bin de. Kete bin konê de, dît ku Dîlberê wa ye di nav hinek mirovan de ji piya de rawestayî ye. Dîlberê hê bi wan cilan bû, ku berê lêbûn. Hê cilên xwe ne guherandi bû. Gava ku Dîlberê jî ew her weha dît, hema wilo tenê li nav çawên wî meyizand. Lê qirika wê tijî bû. Di wê heyamê de Memyan Beg jî keti bû hundurê û hati bû û li ber wê bû. Bedran Beg gava ku Dîlberê dît, êdî bi lezê re derket û berê xwe da konê ku Reşo Axa lê dima. Gava ku hat bin konê xwe, êdî gote hinek mirovan ku bi wî re bûn: 'Herin wî netijî bênin nig min!' Bi lezê çûn ku wî bihênen. Bedran Beg kete bin kon de. Pê re tebatî ne bû, ku rûnihê. Lê li hêviya wî bû ku werin hevberê wî. Di wê heyamê de şervanek da devê kon û bi slavê re kete hundurê kon de. Şervan rast û rast hat û li hevberê Bedran Beg rawesta û jê re her weha got: 'Begê min, hinek mirov ji aliyên din hatine û dibêjin em dixwazin begê we bibînin. Ji cil û rewşa wan têt têgehîştin ku mirovên sereke û neqandî ne.' Her weha gava ku şervan jê re welê got, Bedran Beg li ser yekî sereke zivirî û gotiyê: 'Here Reşo bihêne, lê ta ku ez tiliya xwe şanî we ne dim, ne kevîn bin kon de!' Yê sereke jê re got 'herê' û di cih de ji bin kon derket. Bedran Beg êdî li lêşker zivirî û gotiyê: 'here bêjê wan bila werin hindurê!' Bedran Beg fahmkiri bû ku ji eşîra Silo Axa hinek mirovên sereke şandine, ku bi wî re hevdiîtinan bikin. Bedran Beg xwe amade kir û ew jî hatin li

hevberê wî rûniştin. Bedran Beg dît ku hinek mirov ku pir in wê hatina ku bi wî re hevdîtina çêbikin. Bedran Beg dihizirî di serê xwe de. Gava ku hatin her weha li wan meyizand û bi wan re peyivî: 'Hûn bi xêr hatine! Ez fêhm dikim, ku hûn ji wir hatine, vêca ka bêjin ku hûn ê çî bêjin' Yekî ku di nav wan de hinekî bêhtir kal dihate xuyakirin, pêşikê li hevberê wî bi rêzê re dest bi axiftina xwe kir û weha got: 'Begê min, pêşikê ez slavê xwe û yên ku ez ji nig wan hatîme ji Te re dibêjim. Em hatine ku em hinekî bi hev re bipeyivin û em çareseriyekê di nav xwe de bibînin. Tu ji dizane ku eşîra me berê gelekî bêhtir bi ser hevdu ve diçûn. Vê rewşa ku bûye, biçendî ku we êşandiye, me jî her weha êşandiye. Em çî carî vê rewşê na pêjirînin. Ji xwe li gor nêzîkatiya me ya mirovahî û gelêrî jî ev tiştekî gelekî ne baş e. Divêt ku Tu jî vê yekê zanibî ku ez bi serê bavê Te sînd dixûm ku di vê rewşê de êşa me yek e. Vêca çareseriyê mirovî ku em hatine bibînin, em di nav xwe hevdu de vê bibînin.' Gava ku yê kal axiftina xwe hew kir û pê de, êdî Bedran Beg hinekî bi hizir di cihê xwe de ma xuya dikir. Gava ku hinekî bêdeng ma, êpişt re dest bi axiftine kir bi wan re peyivî: 'Weke ku hûn ji dibînin ku em ji bo xwîna xwe hatine. Ta ku me xwîna xwe ne hildabe em na vegerin. Vêce ez nuha ji we re bêjim ku begê wa di destê me de ye nuha'. Gava ku Bedran Beg her weha got, êdî hinek leşkeran ku Reşo Axa nav di destê wan de ye, ketine hundurê konê de. Gava ku yên ku hatin ew di destê wan de dîtin, tiştek ne gotin, her weha lê meyizandin. Lê yê kal ku pêşikê dipeyivî, carekê din mafê axiftinê hilda û weha got: 'Gava ku em pê hesiya bûn ku ew rewş çê bû bû, êdî me ew ji xwe ne dijimart. Divêt ku ez bêjim ku ew êdî ne ji xwîna ma ye!' Piştî vê gotinê re Bedran Beg jî gotina xwe weha berdewam kir: 'Hûn nuha hatine nig min. Weke ku hûn hatibin mala min ev ji

min re bi wate ye. Ez destên wa vala na vegeînim. Lê ev herêm ji î roj û pê de wê bi herêma me ve be. Gotina me êdî wê li vîr bibihure. Hûn gerek e vê yekê herê bikin. Dilê me bi xwuşka me û kurêmê me biêşe. Ev tiştê ku hatî kirin, çî carî wê ne yê jibîrkirin. Lê her weha divêt ez ji we re bêjim, ku hûn jî zanibûn ku ew Reşo Axa qisasê me ye û nuha jî di destê me de ye. We ji min re got ku ew ne ji me ye êdî. Her weha li kirina wî û di vê rewşê de li wî xwedîderneketin jî bandûek li ser min kir. Bi vê yekê re ez dikarim bêjim, ku nuha ji vir herin êdî ji xelkê xwe re bêjin, ku wê şer ne be. Lê divêt çî gav jî tiştêk weha di nav me de ne be. Em mirovê hevdu ne. Lê ew kirina ku hatî kirin çî carî ne ji kirina mirovahiyê ye. Çî carekê jî bêmirovahiya weha bêbersiv na mîne. Wê î roj jî bêguman ne mîne. Em bêbersiv na hêlin. Ew Reşo Axa bê ceza na mîne. Wê serê wî lêkeve. Divêt hûn jî vê yekê zanibin. Divêt ku ez ji we re bêjim ku nuha hûn li nig min in. Ku wa nuha buhurandin ji bo wî xwastiba û li wî xwedî derketi ba, êdî wê şerekî mazin di navbera me de çê bûba. Lê we nuha li nig min hûn bi zimanekî di re dipeyvîn. Nêzîkatiya bi mirovahî her dem li nig me li ser seran e. Weke hûn jî dibînen em ji bo şer hatine. Me xwe ji şer re amade kir û em hatin. Xwîna me jî li erdê ye û em ê ji erdê hildin. Vê yekê jî divêt ku hûn zani bin.’ Di nav wan de yê kal bersiva Bedran Beg da: ‘Ta î roj jî em bi hev re bûn, ji î roj pê de jî em ê bi hev re bin. Rewşa ku bûye, bi çendî we, me jî êşand û serê me kire ber me de. Divêt ku ez bêjim, ku em ji bana, me yê ji bêbersiv ne hişti ba. Bêguman ev ne ew rewş eku bêbersiv were hiştin. Em vê rewşê weke ku dest bêt avêtina keça me dijimart. Min nuha li hevberê xwe mirovên zane dît. Mirovê ku dewsa bavê xwe girtiye min dît. Em di vir de weke hevdu dihizirîn ku ji bo mirovê pîs û nebaş gelek xûn ne yêt rijandin. Ji ber



ku ew ne hêjayê vê yekê ne. Lê mirovê nebaş her dem jî bi xwe re nebaşî hanîne. Bi vê yekê re ez rêza xwe ji Te re didim nîşandan.’ Piştî wan gotinan êdî hinekî bêdengî bû. Piştî ku hinekî di navîngê de bêdengi çê bû, êdî pê de dîsan yê kal mafê axiftinê hilda û ji Bedran Beg re got: ‘Begê min dêştûra Te hebe, em ê êdî herin û xeberê bidine hevalên xwe jî ji bo ku ew jî vê yekê zani bin. Wê bi vê yekê re gelekî dilê wan xweş bibe.’ Gava ku yê kal her weha ji Bedran Beg re got, Bedran Beg ji got ‘destûr ya Te ye.’ Bi vê yekê re ew ji hundurê konê derketin û ketine ser riya xwe. Mirov din ji yê ku li nig ye kal bûn û pê re hati bûn û li nig ma bûn, di serê xwe de dihizirîn, ku ma Bedran Beg leyîstikek bi wan re kir an na. Yê kal gava ku lê dihate meyizandin, dihate têgehîştin ku bi bawer bû ji gotina Bedran Beg.

Di vir de hêja ye ku ku mirov du sê gotinan li ser wî mirove kal jî bêjê. Ew bi xwe ji biçûkatiya xwe ve li nig Silo Axa bi cih bû bû û bi gelek mirovên zane re ji rûnişti bû û ma bû. Mirov baweriya xwe bi wî dihanîn. Ji xeynê vê yekê jî, mirovekî gelekî xwendî bû jî. Silo Axa bi xwe gava ku hê sax bû, ku biryareke girîng daba, bi wî dişewirî û pişt re biryara xwe dida. Gava ku ew bi xwe jî hê biçûk bû, di şerekî ku bûbû, malbata hemûkan winda kiri bû. Piştî vê yekê ew bi xwe ji aliyê axê ve hati bû hildan û li nig axê hati bû mazinkirin. Bavê wî mirovekî ku gelekî qenciya wî giha bû axê di dema xwe de. Ji ber vê yekê bû, ku navê wî Avdû bû. Lê axe navê bavê wî lê kiri bû û nava wî kiri bû Husên. Mirov di gotinê Husên Beg. Bavê wî mirovekî weke serekekî bû, ku li nig beg bû. Ji ber vê yekê jî mirovekî gelekî rêz jê re digirtin. Her weha zanebûna wî û pîrbûna wî di wê demê de jê re dibû bingeha rêzdayineke mazin. Bi vê yekê re êdî koma ku hati bû,

her weha bersiva xwe hilda bû êdî divegeriya ku herin nig serekên eşîran û bi wan re encama ku bi dest xistibûn havpar bikin.

Bi ji naskirine vê encamê êdî rewşeke din li wan serwer dibe. Gumana wan ji şer têt birînê. Lê hinek ji wan jî dibêjin; 'divêt ku em rewşa xwe biparêzin, ta ku Bedran Beg bi hêza xwe ji vir here.' Hinekên din ji wan dibêjin; 'em hêza xwe her weha halo bihêlin vêca ew jî wê bêjin ku em şer dixwazin û li bende ne ku bi kevin şer de. Ev jî wê rewşeke nû ji me re derxe holê.' Lê yê kal jî her weha di wê hizrê de ye, ku bikevine rewşeke asayî de. Gava ku wî ji her weha hizra xwe hanibû ser zimên, êdî yên ku hizrên wan ne bi awayî re hebûn, hizrên xwe yên cuda ne hanîbûn ser ziman. Di serê mirov de hê jî rewşeke neasayî hebû ji ber ku hê jî du hêzen ku mazinbûn li hevberê hevdu bûn. Çawa ku di li nig serekeyan bawerî çê bûbû û hinekî dem ji ser çûbû, wisan di şeran de rewş ber bi asayîbûnê ve diçû.

Hêza Lolan Beg jî hinekî ji hêza mazin ya ku Bedran Beg li ser bû, dûr bi cih bû bû. Lolan Beg bi hêza ku li ser serê wê bû, hinekî xwe nêzîktirî navendê bi cih kiri bû. Li pêşiya wan jî cihekî ku mirov jê av dibir û digotinê de Berkahniyê hebû. Lolan Beg mirovên ku pê re jî bûn, kar ji wê avê dîtin. Di wê heyamê de hinek mirovê ku jê sûd û kelk werdigirtin, dihatin ser avê. Lê mirovên ku dihatin, hemû jî gava li wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku leşker bûn. Gava ku ewan dihên dibînin, ku hinek ji leşkerê Lolan Beg jî wa ye li ser avê ne, kar jê dibînin. Gava ku leşkerên din jî dihên û li cihekî ku hinekî ji hev dûr e bi cih dibin. Di wê heyamê de li hevberê hevdu dirawestin. Leşkerek ji yê Lolan Beg dibêjê hevalên xwe; 'meyizêne ew leşkerên Reşo ne!' Gava ku ew her weha dibêje, êdî ev gotin li zora wan diçe. Gava ku li zora wan diçe, êdî dest bi xebera

gahandina hevdu dikin. Her weha sê çar xeberan ji hevdu re digihênen. Bi vî awayî naveng germ dibe û dest bi lihevxitina hevdu dikin. Di wê heyamê de jî deng çû ji herdu aliyan jî. Gelek leşker digihîjin hevdu û dest bi şerê hev dikin. Nûçe digihîjê hêzên mazin êdî lihevxitin mazin dibe û şer di nav wan de derdikeve. Nûçe digihîje Bedran Beg û Bedran Beg derdikeve da ku meyizêne, ku ma çî heye lê gava ku ew dimeyizêne dibîne ku va ye şer dest pê kiriye. Hêza Bedran Beg gelekî mazin û xurt bû. Di demeke kin çî hêze ku digihanê de bi ser hev re dipealixandin. Şer qewimî bû û ji deng û nalînan çî kesekî dengê hevdu ne dikirin. Gava ku her weha bû, êdî hêze Bedran Beg li gor nîzama xwe ya ku hatî kifşkirin re, dikeve qade şer de. Hêza Bedran Beg bi vê yekê re li Berkahniyê na mîne ku wê derê pak dike û ber bi navendê ve dest bi çûnê dike. Bedran Beg di wê heyamê de nûçeyê dide Lolan Beg, Nîge Beg û Memyan Beg da ku hêzen xwe li gor nîzamê bi cih bikin. Di wê heyamê de jî weke sê çar suwarên ku bi lezê dihatin wê navendê ber bi aliyê wan ve. Ew ên ku dihatin jî, hatin kifşkirin ku hinek ji wan mirovên serekê yên eşîrê bi xwe bûn. Gava ku dihên rast û rast li ber Bedran Beg datînin. Bedran Beg bi hêrs li wan dimeyizêne û ji wan dipirse: 'we got em ve rewşê herê na kin lê nuha hûn şerê çî dikin?' Yekî ji wan li Bedran Beg meyizand û gotiyê de: 'Divêt Tu bawer bikî ku haya me ji vê rewşê nîn e. Ji me re jî hat gotin ku hêza wa hêriş kiriye. Em hatin ku ji Te re bêjin ku ka em vê bidin rawestan.' Piştî vê gotina wan, Bedran Beg jî ji wan re dibêjê: 'Herin û hêzen xwe paş ve bikişênin di cih de yan na wê zor be ku şer bêt rawestandî.' Bi vê gotina Bedran Beg re, ew jî di cih de diherin û hêzen xwe bi paş ve dikîşînin. Gava ku ew hêzên xwe bi paş ve dikişênin, êdî hêdî hêdî bi gotina Bedran Beg re rawestandîtin di nav hêzen wî de çêdibe. Lê di

wê dema kin de jî gelek leşker ji aliyên din hati bûn kuştin. Hêzen Bedran Beg bi gotina wî re divegere cihên xwe de. Bi vegeřenadinê re rewş hêdî hêdî asayî dibe.

Bi wê rewşê re Bedran Beg hinekî dihizire. Piştî ku hinekî dihizire, êdî bi mirovên ku li dora wî ne, xeberê ji wan ên sereke ne û li ser serê eşîran e. Ji wan re dibêje: 'Leşkerên wan bi şûr û mirtalên xwe berdin. Em dikevîne hundurê navendê de yên ku xeletîyan ne ke çî xesar ji me wê ne gihê wan. Lê yên ku li hevberê me rabin, em ê çîne ser wan û wê xêsarê bibînin.' Piştî ku Bedran Beg ev ferman şand, êdî ji mirovên li dora xwe re ji dibêjê: 'Amade bin, karê xwe bikin û nîzama xwe bigirin em ê kevîne hundurê navendê de!' Rewş bi ve gotina Bedran Beg re keti bû rewşeke din de. Wê çî bûba ew jî êdî ni zani bû.

Lê Bedran Beg jî gelekî dihizirî ku ka wê çî bûba. Dihizirî ku hêzen wî ka çûbûna navendê de, şerêkî mazin jî rû daba. Bêguman bi ketina navendê re wê şer jî qewimî ba. Ji ber ku lihevxiştina li Berkahniyê bi herdû aliyên re nasîkbûnekê peyda bû. Ev nasîkbûn jî di wê kêlîkê de mirovan li ser linga hêştî bû. Bedran Beg bi xwe bi bawer bû, ku hêza wî jî pir mazin û bi nizam bûn. Çî hêz bêhtir ni kari bû ku li hevberê hêza wî biraweste. Di lêvxiştina li Berkahniyê ev yek jî pir baş hati bû dîtin. Ji aliyekî ve hêza Bedran Beg rast û rast ji bo şer xwe amade kiri bû û hati bû. Her weha ji aliyê derûniyê ve jî gelekî xort li ser xwe bûn. Lê dîsan gava ku li Bedran Beg dihate meyizandin, dihate dîtin ku bi hizir bû. Di serê wî de tiştên hebûn ku ew gelekî didane hizirandin. Bedran Beg piştî ku mirovek kiri bû nûçevan û şandi bû, êdî ew jî hinekî ji devê konê xwe wir de li ser latekî rûniştî bû li navendê dimeyizand. Di rewşa xwe de bêdeng bû

di wê heyamê de. Mirovên ku bi wî re bûn jî li nig wî di bêdengiyê de bûn.

Bedran Beg gava ku wê tiştê ku ji nûçegihan re gotiba, Goti bû û êdî nûçegihan jî keti bû rê de û rast û rast çûbû ber bi navendê. Nûçegihan gava ku bi çûna xwe re digihê ber navendê, li wir hinek leşker hebûn ku dipan. Leşkerên jê dipirsin ku ka ew kî ye û ji ber çi hatiye. Ew jî dibêjê: 'Ez nûçegihan im û fermanek ji begê min ji serekên eşîra we re heye.' Gava ku leşker vê yekê dibihîsin, wî di cih de digirin û dibin nig yekî ku weke serleşker têt xuyakirin. Gava ku ew dibîne hevberê wî, êdî ew jî jê dipirse, ku kî ye û ji ber çi hatiye. Ew ji wî re dibêjê: 'Ez peyamnêr im û xebereke min ji serekan re heye.' Serleşker wî dihilde û dibe nig serekeyan. Bi vî awayî bi serleşker re û bi leşkerên din jî diçine nig serekeyan. Gava ku diçin nûçegihan dibîne ku li hevdu rûniştine û ji dipeyivin. Nûçegihan gava ku diçe û li hevberê wan diraweste, bala wan hemûkan diçe ser wî. Gava ku nûçegihan li hevberê wan e, yek ji wan jê re dibêjê: 'Me bihîst ku te nûçeyek haniye. De ka bêjê ku ka ma te çi haniye, te çi ji me re bêjî.' Nûçegihan ji wan re her weha gotina bege xwe dibêje: 'Begê min ji we re nûçeyek şand bi min re. Ez ji bo vê xeberê bêjim hatîme vederê. Ez ê ji we re bêjim û vegerim û çime nig begê xwe careke din. Begê min her weha got: 'Êm ê bikevine nav hundurê navendê de, lê divêt ku çi kesek li hevberê me bi şûr û martal ne raweste. Begê min got ku tişteke ji wan ne be, wê tişteke ji me ne be. Begê min ew jî got ku bila li hevber me ne bin û bila ji bo Reşo Axa'yê nebaş bi me re nekevîne şer de.' Piştî wan gotinan serekeyekî gelekî kal bû, ji nûçegihan re weha peyivî ku ji begê xwe re bêjê: 'Nuha ji vir bi xêr û slamet here cihê xwe û ji begê xwe re bêjê ku rêza me wê jê re hebe. Em dixwazin bi Bedran Beg re hev

bibînin. Ku tu çûyî, êdî ew ên ku çêkin wê li pey te werine wir.’ Gava ku yê sereke û kal ev gotin got, êdî pê de nûçegihan jî karê xwe kir û ji wir derket ku bikeve ser riya xwe de û vegere cihê xwe. Nûçegihan gava ku ji wir derketi bû hinekî bi lez keti bû ser rê de ji bo ku ew here û zû xwe bigehîne nig begê xwe. Da ku tiştê ku dîtî û seh kirî ji wî re bibêje. Gava ku nûçegihan ji nig serekeyan derdikeve, êdî bêyî asteng dikeve ser riya xwe de û digere cihê xwe. Di demeke kin de nûçegihan digihijê nig Bedran Beg. Gava ku nûçegihan digihijê nig Bedran Beg, pêşîkê slava xwe didiyê de û jê re her weha dibêje: ‘Begê min nûçeya Te weke Te ji min re gotî, min ji wan re got. Lê sereke gotin, ku em jî dixwazin pêşîkê bi beg re hevdîtina çê bikin. Her weha gotine min ku gava ku tu çûyî, pişt te re em ê jî werine wir da ku bi beg re hevdîtin çêbikin.’ Nûçegihan bi van gotinan re axiftina xwe hew kir. Gava ku nûçegihan axiftina xwe hew kir, Bedran Beg jî weke kêlîkêkê di cihê xwe de bêdeng ma û pişt re her weha got: ‘Bila werin em ê li hêviya wan bisekinîn.’ Piştî vê gotinê Bedran Beg hinekî bêdeng bû bû dîsan. Weke heyamekê di cihê xwe de dimîne nûçeyek jê re têt, ku wa ye serekên eşîran dihên. Bedran Beg gava ku ew dihên, wan dihilde nig xwe û li wan dihesîne. Serekên eşîra gava ku dihên, pêşîkê slava xwe didin û bi beg re dest bi peyivtinê dikan. Li nav wan ên ku hati bûn; Husên Beg jî hebû. Husên Beg berê jî hati bû û yekî ku gelekî kal û zane bû. Mirov li gotina wî pir dihesand. Gava hatin û li hevberê Bedran Beg rawestan, dîsan weke cara pêşî Husên Beg pêşîkê mafê axiftinê hilda û dest bi axiftinê kir. Gava ku dest bi axiftinê kir, di serî de her weha ji beg re got: ‘Begê min, Te nûçeyek şand ku Te biryar daye ku bi leşkerên xwe re Tu werî û bikevî navendê. Begê min, divêt ku ez di serî de ji te re bêjim, ku em ne li hevber in, ku hûn werin bikevin

navendê. Lê weke ku Tu jî dizanî rewş hinekî nasiktir bûye. Di ve rewşê de em na xwazin ku hîn bêhtir xwîn were rijandin. Rûdana li Berkahniyê jî gelekî em êşandin. Tu jî dizanî ku nuha ku hûn bikevine hundurê de, wê zor be ku mirov sehêtkirinê bike. Lê hûn jî werin bi yên li dora xwe re û bibine mêhvanê me. Bila ev hatine we bête jimartin ku hûn tev de hatine wir. Wî çaxî wê naveng sar bibe. Xelk jî we weke begê xwe bibînin.’ Piştî van gotinên Husên Beg re, hinekî bédengi çê bû. Li gor wê rewşê ev yek ne tişteki ku xelet dihate xuyakirin. Herdu aliyan jî mirovên ji yek axî bûn, ji hev bûn û yek bûn. Bedran Beg piştî ku Husên Beg ev yekê jê re got û yên li dora Husên Beg yên ku pê re hati bûn herêkirin, êdî got: ‘Ez ê hinekî bihizirîm, ez ê biryara xwe paşê bidim.’ Husên Beg, piştî ku beg weha ferman da, êdî carekê din mafê axiftinê hilda û got: ‘Begê min, gava em nuha herin, ku begê me jî bi me re were, wê gelekî hêja be. Mirov wî çaxî wê gelekî rêzê bidine begê min û wê bibînin ku mazinatiya begê min herê kiriye, êdî wê ew jî herê bikin.’ Piştî ku Husên Beg van gotinan jî gotin êdî pê de dîsan bédengi di nav herdu aliyan de çê bû. Mirovên ku weke sereke li dora Bedran Beg jî bûn, li nav çavên wî dimeyizandin, ka wê çi biryarê bida. Hîna beg bédengiya xwe hew ne kiri bû, Husên Beg careke din mafê xeberdenê hilda û jê re dîsan got: ‘Begê min, divêt ku hûn bawer bikin ew şerê li Berkahniyê di dilê mirovê me de êşandineke mazin çêkiriye. Ew êşandin tenê ne ji ber şer bûye. Ji ber ku ji ber rewşeke halo û nebaş jî ketina nav şer jî êşandinekê çê kiriye. Loma jî, ku hûn werin wê mirov gelekî dilxweş bibin. Gava ku hûn hatin, wî çaxî mirov bêjin, ku êdî ji bo vê rewşa nebaş wê şer ne be û kuştin jî ne be. Ev yek wê di dilê mirov de gelekî mazin cih bigre.’ Piştî wan gotinan Bedran Beg biryara xwe dide û ji wan re dibêje: ‘Ez ê werim

bi wê re.’ Bi vê gotinê re gelek mirov jî karê xwe kirin ku bi wî re herin. Bedran Beg jî careke din ji serekeyan re dibêjê: ‘Ez hatim divêt ku leşker şûr û martalên xwe berda bin.’ Bi vê gotinê re jî ji wir ji nig Bedran Beg, ew li pêşiya wan di cih de bi serekeyan divegerin ku rewşê asayî bikin. Husên Beg û hinek ji wan serekeyên din jî dimênin li nig Bedran Beg ku pêk ve vegerin. Yê ku li pêşiyê jî dihên, dikin ku leşkerên wan şûr û martelên xwe dahênin û xwe ji nizama şer vekin. Yê ku li pêşîkê tên baweriya wan bi mirovan têt kirin, ku wê êdî şer ne be.

Mirov ne dixwast, ku di wê rewşê de şer bikin. Ji ber ku rewşeke gelekî berûmet dîtî û gelekî pê diêşyan. Ji ber vê yekê jî ne dîxwastin ku bikevine şer de. Di dilê mirov de çî kesekî jî ne dixwast, ku ji bo wê rewşê şer bikin. Mirov gava ku dihizirîn, ji xwe re digotin, ku tiştê ku Reşo Axa kiri bû ne tiştê rast bû. Madem ku nerast e, çima ji bo wê nerastbûnê wê şer bêt kirin. Mirov gelekî dihizirîn. Berî wê demê jî mirovên herdu herêman bêhtir ji bi ser hevdu bûn û gelek ji wan jî mermalên hevdu bûn. Di wê rewşê de jî şer ku çê bûba, wê gelekî û gelekî êşandina mazin çêkiri bana. Jiyanê xwezayî di nav mirovan de hebû û mirov dixwastin, ku wê jiyane biparastana. Ta wê demê, hê rewşeke weha rû ne da bû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêjê, tiştê ku Reşo Axa kirî, mirov gelekî êşandi bû. Ji serekê ku ji bo wî û rewşa wî ne şerekî birûmet ne dihat dîtî. Di vê xalê de, bi hatina Bedran Beg re jî, di nav xwe de wê şiyarbûnek kiri bana û mirov wê jiyana xwe, weke berê berdewam kiri bana. Her weha ji hêvîyeke mazin hebû.

Bedran Beg biryara xwe ya çûnê dide di nav mirovan de çûn û hatineke mazin dest pê kiri bû. Ji aliyê Bedran Beg ve jî gelek mirovên ku mazin û xurtbûn, xwe amade dikirin ji bo ku bi wî re



herin. Lê di wê heyamê de hinekî bédengi jî bi Bedran Beg re dihate xuyakirin. Mirovên ku li nig wî rûniştî bûn jî, ne dixwastin ku wê bédengiyê xira bikin. Her weha wan jî di cihê xwe de bédeng ma bûn. Husên Beg jî li nig wî rûniştî bû û ew ji di bédengiyekê de bû. Ew mirovekî zane bû. Ew yekî ku dipeyivî mirov li gotinên ku ji devê wî derdiketin dimeyizandin. Ew jî bi serekên eşîran re hati bû, da ku pêşî li şerêkî bigre. Rewş weke ku dihate xuyakirin gelekî û gelekî taybet û nasik bû. Di kêmasiyeke biçûçik de, wê serencamên mazin derketi ba holê. Ji ber vê yekê jî diviya bû ku gelekî bi bal tevbigerin. Husên Beg bi xwe jî berê di gelek rewşên zor de mabû. Gava ku begê wî sax bû, bi wî re çûbû gelek seferan. Her weha di wan seferan de jî keti bû gelek şeran de. Ji vî aliyê ve diviya bû, ku mirov bêjê ku gelekî dîti bû. Lê gava ku çûbû seferan jî, ji nig axayê xwe çî carekê jî qut ne bû bû. Ji ber vê yekê jî, baweriya mirov pê mazin bû. Baweriya mirov her weha li zanebûn û pêzanînên wî hebû. Gava ku axa çûbû rahmetê, êdî Husên Beg weke yekî ku pist wî re ku li gotina wî bihesînin, dimeyizandin. Ji ber vê yekê jî, gava ku hati bûn nig Bedran Beg, her weha ew hati bû û ew dipeyivî. Yekî gelekî kal bû. Ji vî aliyê ve jî mirov rêzeke mazin didanê. De wê demê de ew kalbûna wî û pêşeroja wî, dibû bingeha ku wî mazin bidîtina û rêzeke mazin bidana wî. Gava ku hati bû nig Bedran Beg jî, mirov pêşîkê mafê axiftinê ji wî re hêştibû. Bedran Beg jî li pêşiya wî ne dipeyivî. Pêşîkê ew dipeyivî û mirov li wî dihesandin û paşê yên li dora wî hizra xwe goti bûn. Di vir de hêja ye, ku divêt mirov bêjê rêzbûn di pergala civakê ya ku pêşketi bû de, xwediyê hinek taybetmendiyan bû. Di wê rewşê de her weha van taybetmendiyan bi wî awayî xwe didane ber çavan. Rêzgirtin her weha dibû bingeha gelek tiştên baş di rewşên weha de. Bêguman di rewşên weha de

hebûna rêzê girîng e. Di xalê pêşîkê de dibû bingeha lihevhesandinê. Gava ku li dihesandin jî, êdî mirov dikarê bêjê, ku çûna ser pirsgerêkan ji bo çarêserkirinê wê encam bidana. Husên Beg jî di wê rewşê de xwediyê wateyê mazin bû. Piştî şerê li Berkahniyê çê bû bû û hinek xwîn jî rijiya Bedran Beg çûna xwe ye navendê herê kiri bû. Ev nêzîkatî bêguman gelekî û gelekî girîng bû û divêt mirov gelekî girîng şirove bikir. Di wê heyamê de dikari bû ku biryara xwe ji bo neçûnê jî bida û gotiba wan ‘na ez na yêm!’ Lê wilo ne got. Nuha jî karê çûna wî dihate kirin. Di vîr de xalên herî mazin ku mirov bibîne û şirove bike çanda xelkê ya pêşketî bû. Li gor wê çandê, gavavêtin ji bo serekêyan jî divêtiyek bû. Bedran Beg jî yekî ku di nav civatêa de pir mabû û nêzîkatiyên xelkê baş fahm kiri bû. Ew zanebûna wî jî di bingeha wê biryara wî de hebû. Rewşa ku Dîlberê têde bû û kuştina Dilşad jî di serê wî de bû û vê yekê wî gelekî jî diêşand. Ji ber vê yekê jî, li hevberê hevdu bûn. Bêguman rewşa Dîlberê jî mirov re gelekî giran dihat. Di civakê de jin weke çandêke ji xeynê hebûna xwe, xwedî wate dihate dîtin. Ewçend ji ferhengeke ku gelekî mirov rêz jê re digirt bû. Ya ku mirov herî mazin êşandî jî, her weha ew rewş bû. Dîlberê pêşî bi keçkaniye xwe ve û pişt re jî bi jinîtiya xwe ve, weke çandêke civakê ji bi wate bû. Dîlberê çandêke civakê bû, ku gelekî jê re rêz dihate girtin. Her weha gava ku li wê rewşa ku tê de bûn dihate meyzandin, dimenekî, gelekî mazin û taybetmend bû.

Bedran Beg di nav mirovên ku li dora wî rûniştî bûn dimeyizand. Lê çavên gelek mirovan jî di wê heyamê de li ser wî bûn. Mirovên ku li dora wî bûn, di wê heyamê de li devê wî dimeyizandin ku gotinêk ji nav lêvên wî derkeve. Ew bi xwe di cihê xwe de bêdengiyek li ser bû. Piştî ku biryara xwe ya çûnê dabû û ji mirovên,

ku li dora wî bûn, jê re goti bûn dest bi karkirina çûnê kiri bû. Di wê kêlîkê de mirovên ku li nig bûn û rûniştî bûn, çavên hemûken jî li devê wî bûn. Di wê heyamê de, mirov tev bi bal bûn. Her kesek di wê kêlîkê de di serê xwe de xwediyê hizrekî bûn, ku Bedran Beg wê çûba wir, wê çî bi bûba. Di rastiyê de jî wê çî bûba çî kesekî ni zanibû. Gotinêke biçûçik jî, ji wan re ji bo ku ketiba ser de têr fikir di wê heyamê de. Vê yekê jî rewşeke gelekî û gelekî nasik çê kiri bû. Di vê navengê de Bedran Beg wê çûba nav eşîra ku hati bûn bi wan re şer bikin. Vê yekê rewşê tenê nasik ne fikir, her weha neasayî jî fikir. Bêguman bi vî awayî diviya bû, ku bihatina gotin, ku rewşeke bêasayî ji xwe hebû. Di wê rewşa neasayî de Bedran Beg diçû nav wan de. Lê çûna Bedran Beg di hundurê xwe de wê çî hanî ba ew jî wê di wê heyamê de diyar bû ba.

Gelek mirovên serekê û xurt jî bi Bedran Beg re diçûn. Ji xeynê vê yekê jî, wê hêzen ku hati bûn hemû jî li ser lingan ji piya ma ba. Her weha hemû kesên amade di cihê xwe de bana. Memyan Beg jî wê bi Bedran Beg re çûba. Lê Lolan Beg û Nîge Beg, wê li ser serê hêzan maban. Ji xeynê vê jî wê gelek mirovên sereke yên ku mazin in, wê li ser serê hêzan amade maban. Vê yekê jî rewşê hê bêhtir neasayî fikir. Di rewşeke asayî de yên ku sereke bûn diviya, bû ku bi beg re çûban. Lê di wê heyamê de wê ne çûba. Ew jî li paş wê maba. Vê yekê jî karê serekên eşîran Silo Axa hê bêhtir diwartir fikir. Hinek mirovên ku di şerê Berkahniyê de ehlên xwe winda kiri bûn, ne dixwastin ku ew were. Ji aliyekî din ve jî serê Reşo Axa hati bû lêxistin û wê yekê jî li ser mirov bandûrake li ber çavan dihat girtin. Mirov tiştê ku wî kiri bû rast ne didîtin. Li ser wî bixwe ji ne dihizirîn. Lê ji ber ku kurê axêye wan bû, di serê wan de mabû. Tiştê ku wî kiri bû jî, weke ku navê axêye wan lewitandin. Ve ji aliyê

derûniyê ve ewan dixiste zorê de. Ji bo wan rewşan diviya bû ku serekeyên eşîran gelekî bi bal û serinc ban, ku tiştê ne baş rû ne daba. Bêguman kêmasiyeke biçûçik jî bûba bingeha serekî û gelekî mazin di nav wan de. Husên Beg gava ku li rewşê dimeyizand, ev yek pir baş didît. Ew bi xwe jî di rewşên welê de, berê jî mabû û dîtî bû, ku di gelek rewşên ji van rewşan de, şer dîsan derketi bû. Vêca di wê heyamê de, ew bi xwe jî, bi rewşeke her wisa re rû bi rû bûn. Çend amadekarî hati bû kirin û hêzeke çawa di wê heyamê de li wir bû, wî dizani bû. Ji xeynî vê yekê jî, dihizirî ku ew hêza ku di wê heyamê de didît, ku ketiba ser de, wê çend xirabiyeke mazin bi xwe re bihaniya, mirovên ku ji bo şer hati bûn, ku li wan dihate meyizandin, dihate dîtin, ku hemû jî, jêhatî bûn û gelekî jî bi hêz bûn. Husên Beg yekî ku di gelek rewşan de buhurti bû. Ji ber vê yekê jî fêhm dikir ku şerek qewimî ba, wê çend pelixandin bi xwe re bihaniya. Bi vî awayî, çûna Bedran Beg ji bo wan û ji bo herêma wan gelek û gelekî girîng bû.

Gava ku amadekarî hew bû bûn û xeber ji Bedran Beg re hati bû şandin, ku hemû tişt amade ye ji bo çûnê, êdî ew jî ji cihê xwe dirabe û ber bi devê konê ve diçe, ku herin. Mirovên ku wê pê re çûba jî li nig bûn. Ji derve jî mirovên ku karê xwe kiri bûn, ku bi wî re biçin, hebûn. Husên Beg jî gava ku ew rabû bûn ser xwe ji bo çûnê, êdî wî jî dabû xwe û keti bû rex wan, da ku bi wan re be. Hespê Bedran Beg yê ku sipi bû li devê derî bû û hefsarê hespê wî di destê seyisvanekî de bû û li hêviya wî bû. Bedran Beg gava ku hat derve pêşîkê hinekî li dora xwe meyizand û pişt re bi yê ku wê pê re herin, bi hev re her yek li hespên xwe suwar bûn. Husên Beg ji hespê ku pê hati bû, lê suwar dibe û bi hespê xwe re dikeve rex wan. Her weha yê ku bi Husên Beg re hati bûn û ku sereke bûn, ew jî li

hespan suwar bû bûn û dabû bûn rex wan. Li hespên xwe suwar bûn êdî dana rex hevdu û ketine ser re de da ku herine navendê. Di wê heyamê de jî di dilê mirov de got û goteke mazin hebû. Xwîna hemûkan di wê heyamê de di laşên wan de germ diçû û dihat. Bedran Beg li pêşiya gelek mirovên, ku li ser hespan suwarbûyi bûn û bi hev re dane ser rê û di rê de çûne bi ber navendê ve. Bedran Beg gava ku li ser hêsp diçû hinekî bi hizir bû. Di rê de gava ku diçe, weke carekê du carên ji serê xwe li dora xwe dizivirîne û li mirovên ku bi wî re hatine dimeyizêne. Gava ku dimeyizêne dibine ku bala mirovan tev li ser wî bû. Di wê heyamê de her gavê wî, ji aliyê mirovî ve di ber çavan de dihate buhurandin. Çawa weke ku hinekî li ser hespan di rêde diherin, êdî digihine ber navendê. Bedran Beg û yên ku pê re ne, ku digihîjine ber navendê û pişt re, weke kêlîkêke ku li ser hespan, peyade diçin êdî digihîjine nav malên ku bikevine hunduruyê navendê de.

Bedran Beg û yên ku pê re ne, ku dikevîne nav navendê de, ber bi mala axê ve diçin. Çavên gelek li ser wî bû. Mirov bi bal li wî dimeyizandin. Lê dilê mirov jî di wê heyamê de gelek û gelekî ji dilperî diavêt. Di rex Bedran Beg de jî Husên Beg hebû. Mirov Husên Beg baş û qenc nas dikir. Gava ku Husên Beg di rex Bedran Beg de tê dîtin, êdî baweriya wan têt, ku êdî ne ma şer bibe. Ji xwe gava ku Bedran Beg di nav navendê de diçû, kesên ku bi şûr û mertal bûn, li ber çavên wî ne diketin. Tenê yên ku ji bo ewlekeriyê hebûn, bi wan re şûr û mertal dihate xuyakirin. Gava ku Bedran Beg gotibû; 'divêt ku hûn şûr û mertalên xwe dahênin' êdî serekeyên eşîran, ku pêşikê vegeriya bûn ji bo ku şûr û mertalên di destên mirovan de ne mîne û ne yêt xuyakirin, gelekî çûbûn û hati bûn. Wan xwastibû ku jiyanekê, ku weke jiyanekê asayî bidine nîşandan. Lê bêguman di

wê heyamê de, her tişt ne asayî bû. Hebûna Bedran Beg û hatina wî ku dihate dîtin, dihate têgehîştin, ku gelekî neasayîbûn hebû. Gava ku Bedran Beg û yê ku pê re ne hêdî hêdî digihine nêzîki mala axê, têt dîtin ku gelek mirov ku li wir xuya dikin. Bedran Beg bi hespê xwe re û bi yê ku pê re ne û bi yê ku li dora wî ne, dikeve nav wan mirovan û dibuhure, ku bikeve nav hewşa mala axê ya gelekî mazin e. Mirovên ku li wir bûn gelekî li wan dimeyizand. Wan mirovên ku li wir bûn, hineke ji wan berê Bedran Beg dîti bûn. Bedran Beg jî ew dîti bûn. Gava ku gihan dehma hevdu, hinek ji wan mirovan slav jî didanêde û dibuhurtin. Gava ku dikevîne hewşa malê û hinekî ji dibuhurin, hinek jinên ku navserî bûn, ji hinekî dûrî ve dihatine dîtin. Ew jin tev bi xiftan bûn. Bedran Beg digihê dehma wan, dibîne ku ew bi bal li wî dimeyizandin. Bedran Beg jî gava ji nig wan dibuhure li wan dimeyizêne. Di buhurtinê de dihêne ber cihê tewla hespan li wir hinek seyisvan amade ne. Bedran Beg li pêşî çûn hundurû. Bedran Beg Gava ku çû hundurû hê li devê derî yekî, ku sereke bû rê şanî wî dide, ku herine hundurû û rûnên. Wî jê re got: 'Begê min biferman derbasî hundur bin!' Bedran Beg tiştê ne got û qevza xwe pêşî di devê derî de avêt û kete hundurû de. Di vir de hêja ye, ku divêt mirov bêjê, ku pêşîkê rêdayin weke rêzeke têt nîşandan. Gava yê sereke di devê derî de xwe dide paş û rê dide Bedran Beg, ev weke rêzekê hat dîtin. Memyan Beg jî bi Bedran Beg re bû. Ew jî di rex wî de bû.

Bi hev re hinekî li hundurû dimînin û pişt re dikin, ku derkevin û herin. Lê berî ku derkevin Bedran Beg jî, her weha ji wan dipeyive: 'Hûn hemû jî dizanin ku di vir de kurêmê min hat kuştin ku bi xwuşka min re bû. Lê ez nuha li wir im. Vê yekê divêt ku were zanîn ku ev çî car jî na yê jibîrkirin. Min Reşo xiste qisas ji wî re û serê wî

lêxist. Wê jî got; em li hevberê vê rewşê ne û em na xwazin ji bo vê şer bikin. Bi vê yekê re şer ne bû. Ji dêla wê jî nuha ez li vir im. Ji îro pê de, wê ev der girêdayî me be. We ji vê yekê re jî got herê. Vêca nuha ez ê tiştêkî bêjim, ku divêt hûn bikin. Nuha peyamnêrek ji nav xwe derxin û bişînine Cizîra Bota û Mîrzan Beg ji werînin da ku ew begîtiya we bike. Ji xeynî vê yekê jî em ê nuha laşê kurêmê xwe bi xwe re ji vir bibin. Bila derbeştê wî were amadekirin, ku em bi xwe re bibin. Bila were li nig bavê xwe bimîne. Bila di cihê ku tê de mayî û mazin bûyi de razê. Lê gerek e ku her kesek ji vê bûyerê ji xwe re fêrekê derxe, ku hêriseke çend mazin e li ser jiyana û rûmete me.' Piştî van gotinan hinekî bêdengi çê bû. Lê bêhtir bêdengi dirêj ne bû û ye ku ev bêdengî xira kir Husên Beg bû. Husên Beg jî, bersiva Bedran weha Beg da: 'Begê min, Tu gelekî baş û xweş dipeyivî. Weke te gotî wê nuha peyamnêr werin amadekirin û bi rêkevin ku herine Cizîra Bota. Ev yek, weke ku begê min li gor mazinatiya xwe dipeyivî û hanî ser ziman, wê her weha li gor wê mazinatiyê were cih. Lê begê min got ku bila derbeştê kurêmê min jî were amadekirin. Ew yek êşa me jî ye. Ev der jî mala wî ye, ku begê min destûr bide, bila li vir li ciyê xwe be.' Piştî ku Husên Beg gotina xwe hew kir û pê de, Bedran Beg carekê din peyivî û ji wan re got: 'Bi goristana wî ye ku hatî çêkirin bila bimîne. Lê bila ew bê hildan ji bo ku here nig dê û bavê xwe. Lê bila goristana wî bimene weke xwe, ku ev rewş û tiştê ku bûyî bila ne yêt jibîrkirin.' Bi van gotinên ku Bedran Beg kirî, bêdengiyek di nav wan de çê bû. Bi wê bêdengiye re serê gelek mirov kete ber wan de. Civat tev bi wê rewşê re gelekî diêşyan.

Piştî ku Bedran Beg peyva xwe hew kir êdî pê de, hinekî din man paşê rabûn ser xwe ku herin. Lê gava ku Bedran Beg behsa

emdekirine derbeştê kurêmê xwe kiri bû, êdî hem di dilê mirovan de êşek çê bû bû û hem jî bi wê dilêşîya mirovan li hev gihabûna hevdu ku amadekariyê bikin. Di nav mirovên zane û alim de jî guftugo dest pê kiri bû. Hinek digotin nerast e, ku ew ji cihê xwe were derxistin û bêt birin li cihekî din. Hinekên din jî digotin, ku gava ku derbeşt hat amadekirin, divêt ji aliyê olî ve tiştên ku werin kirin wê werine kirin û pişt re bermayê wî dikare were birin. Lê mirovê ku vê yekê ne dixwastin tevdigeriyan. Ne dixwastin ku Dilşad ji wê derê were birin. Ji aliyê hestan ve jî hinekî li wan zor dihat. Lê Bedran Beg gotina xwe goti bû û wê bi cih bihaniya. Hê Bedran Beg li wir e dest bi amadekirina birina derbestê hati bû kirin. Her weha di demeke kin de derbestê Dilşad têt amadekirin. Gava ku derbest têt amadekirin, êdî dest bi cihhanîna stûbarên olî têt kirin. Di dema bi cihhanîna stûbarên olî de, Bedran Beg jî amade dibe. Ji aliyê dî ve ji xelkê wê derê tev jî di wê heyamê de amade dibin. Gava ku li wir in û li derbestê Dilşad dimeyizandin, weke ku li tiştê ku hatî serê wan dimeyizandin. Gava ku derbest hat amadekirin û stûbarên olî jî bi cih tên, yên bi Bedran Beg re hati bûn tev li hespên xwe suwar dibin û dikevîne ser rê ku herin. Mirovên herêmê jî cihê ku berê Dilşad lê hati bû danîn, wê derê dikine weke ziyaretgahekî û ji kevîrên reş qûçek lêdikin û li ser hêtan jî naqşan didin çêkirin. Ew mirov jî weke ku Dilşad hê li wir be, wilo xwe bibawer dikin û diçin serdana cihê wî. Gava ku suwarên Bedran Beg jî ji wir bi derbestê rê diçûn û mirov ji paş wan ve li wan dimeyizandin û digotin qey tenê hinek suwarên wa diçin. Wilo li wan dihat. Ji vê yekê pê ve ne dixwastin ku tişteki din bihênine bîra xwe di wê heyamê de. Wan mirovan ne dixwast ku bihênine bîra xwe ku derbestê Dilşad jî bi wan re diçe. Her weha ne dixwastin ku bihizirîn di wê heyamê de.



Lê gava ku Bedran Beg bi derbestê Dilşad re diçû û ku weke heyamekê ji çû êdî hinek mirovên herêmê xwe ne girtin û jin û mêr diketin di nav hevdu de û dane pey wan û çûn ta cihê ku ew lê bûn. Bedran Beg û yên ku pê re ne diherin êdî digihîjin cihê xwe. Piştî re jî koma mirovên ku li pey wan dihat vedigere cihê xwe. Lê leşker gava ku wan dibînen, dikevîne gumanan da ku koma bi ber wan ve dihên gelo kî ne. Lê gava ku kom hinekî nêzîk dibe, têt dîtin, ku jin û zarok û kesên bêçek in. Koma mirovan têt û li ber gora Dilşad'î diraweste. Dîlberê jî di bin konê ku jê re hati bû vegirtin de bû. Gava ku Dîlberê pê dihesse ku derbestê Dilşad hatiye, êdî dide xwe û bi bezê re derdikeve derve û diçe ser derbestê wî. Xwe diavêjê ser derbestê wî. Ji çavên wê dilop hêşiran bi ser hinarikên ruyê wê re dihêne xwarê. Mirov ku rewşa wê dibînin, ji çavê wan jî hêşir dihêne xwarê. Dîlberê jî jiyana jiyabû, gelekî jî pîr keti bû. Laşê wê gelek lawaz keti bû, dihate xuyakirin. Bedran Beg jî gava ku giha bû cihê xwe û kar kiri bû ku here hundurê konê xwe de, bi hatina koma mirovan, êdî li devê kon di cihê xwe de ma bû.

Di wê heyamê de Mihemed, ku ji mêj ve tiştê ne goti bû, li ruyê Bedran Beg meyizand û gotiyê: 'Begê min, Dilşad êdî yê van mirovên ku li pey wî hatina, yê wan e. Ez dibêjim heger ku Tu wî li vir di nav van mirovan de bihêlî, wê baştir bibe.' Bedran Beg li hevberê vê gotina Mihemed hinekî li ruyê wî meyizand û li pêşiya niherî û hinekî hizirî. Pişt re Bedran Beg serê xwe rakir û ji Mihemed re weha got: 'Min jî di vê kêlîkê de, bi hatina van mirovan ev yek fahm kir'. Pişt re Bedran Beg li serekeyên ku li nig wî bûn meyizand û gote wan: 'Cihê Dilşad êdî ev der e. Li vir cihê wî amade kin û wî bi cih bikin. Min nuha fahm kir ku, ew êdî divêt ku li vir be'. Bi vê gotinê re êdî hat gotin ku wê Dilşad li wir were bi cihkirin. Mirov ji

bo vê yekê careke din dest bi karû bar kirin. Dîlberê jî gava ku derbestê Dilşad têt û xwe diavajê ser derbestê, êdî hema wilo dimîne. Di wê heyamê de du sê keç û jin hewl dan ku herin nig Dîlberê û bi destê wê bigrin û wê hildin. Gava ku dirahijin destê wê, dimeyîzînin, ku ew jî wa ye behne xwe bi zorê dide û distêne. Gava ku her weha têt dîtî, êdî du sê kes dikevin bin çengê wê de û wê dibine bin konê w. Lê Dîlberê bêhna xwe bi zore re dida û distand. Kesên ku ew hildan û birin bin konê wê, li ruyê wê dimeyizandin, didîtî ku tenê wa ye hêsir ji çavan wê têne xwarê. Dikir ku bi wan çavên bi hêsir re ji wan mirov re tiştêkî bêjê. Lê Bêhncikandina wê destûr ne didayê de ku bipeyive. Di wê heyamê de Dîlberê ket. Êdî weke ku bêhn ne distand. Kesên ku li ber serê wê bûn, li nav çavên wê dimeyizandin. Hêdî hêdî çavên wê jî dihatine girtin. Mirovên li dorê dikirin, ku bi wê re bipeyivin. Lê hemû kirinên wan bêbersiv diman. Gava ku hat dîtî, ku bêhna wê êdî na yê û naçe, tev qêrînî û kirin. Bi vê yekê re nûçeya Dîlberê digehê Bedran Beg û birayên wê yên din jî, dibihîsin ku Dîlberê êdî behn na stêne. Ew jî bi bazekê re têt ku fahm bikin ku ka çi bûye ji Dîlberê. Dîlberê êdî bêhn ne distand. Hatina Dilşad bi wî awayî re li dilê wê dabû. Gava ku her weha nûçeya Dîlberê hat sehkirin, êdî eşîra Silo Axa bi serekeyan re xelk tev hatine wir. Mirov ku li hevberê hevdu bûn, ku bi hev re şer bikin, êdî keti bûne nav hevdu de û dest bi derbestkirina Dilşad û Dîlberê dikirin. Ziyaretgeha pîroze ku ji bo Dilşad hati bû amadekirin, êdî ji bo herduyan bû. Gava nûçeya Dîlberê jî têt bihîstin, gelekî mirov xemgîn dibin. Mirov ji hevdu dipirsin ma ev çawa bû. Mirov hinekî fahm ne dikir ku dilê Dîlberê jî di wê heyamê de hew lê dida. Dîlberê ta wê kêlîkê li ser lingan dihate xuyakirin. Lê nuha ew jî wek Dilşad bêbêhn xwe dirêj kiri bû li ser cihê xwe. Mirov

li dora wê bûn û bi çavên şil re li wê dimeyizandin. Mirovên ku li dora wê diçûn û dihatin, çavên wan tev şil bûn. Gava ku nûçeya Dîlberê têt bihîstin, êdî koma mirova ya ku li pey Dilşad hati bûn, dihatin bi ber konê Dîlberê ve. Gava ku dihêne nig konê Dîlberê li devê kon kom dibin. Hinek ji wan mirovên ku gelekî pîreji in, dikevîne bin konê de. Gelek ji wan pîrejinan li ber serê wê dirûnin. Gava ku jinên pîr li nig wê dirûnen, êdî weke hemawiyên kesk, sor, zer, sipî û şin bi cihê wê ve girê didin. Hinekan ji wan, hemawîyan diavêjine ser wê jî di wê heyamê de. Her weha hêdî hêdî dest bi derbestkirinawê jî dikirin. Ji derve jî mirov derbestkirina Dilşad dikirin. Mirovên mazin jî li hev gihabûn û mirovên oldar jî li wir amade bûn û stûbarên olî bi cih dihanîn. Mirov bi Dîlber û Dilşad re gelekî êşeke mazin di dilê xwe de seh dikirin. Xemgîniyeke mazin bi mirovan re dihate xuyakirin. Gava ku her weha li mirov dihate meyizandin, dihate dîtin ku xemgîniyê weke perdeyekê bi ser wan mirovan de xwe berda bû. Di wê heyamê de her kesên ku êşa di dilê xwe de seh dikir, ji hev ne cuda bû. Êşa ku dilê wan mirov diguvaşt, yek bû û êşeke gelekî mazin bû. Ew êş êşa Dîlberê bû. Ew êş êşa Dilşad bû. Ew êş êşa du evîndaran bû. Ew êş êşa evînekê bû ku di dilan de bûbû agir û dişewitand.

## VI

Gava ku derbestê Dilşad hati bû Mihemed dîti bû û pê re bû bû êşekî gelek mazin. Pişt re ku nûçeya Dîlberê jî giha bûyê, her weha bi wê jî gelekî di dilê wî de êşandin çê bû bû. Gava ku nûçeya Dîlberê giha bû wî, hingê ew di nav mirovên ku sereke de bû. Mihemed piştî ku nûçeya Dilşad û Dîlberê hildabû êdî gelekî pê bi êş bû. Bêdeng ma bû. Lê di hundurê wî de êşeke mazin di dilê wî de dabû çêkirin. Mihemed berê rewşa ku Dîlberê tê de bû, dîti bû. Ji ber vê yekê jî

hê bêhtir rewşa ku çê bû bû lê dibû êş. Êşa ku pê re çê bû bû gelekî mazin bû. Ew bi xwe ji bo ku ew ji wê rewşê rizgar bibe, çûbû nig mala bavê wê û wî nûçeya serpêhatiya Dîlberê dabû birayên wê. Gava ku xeber dabû wan û ew jî hati bûn êdî ew ji bi wan re hati bû. Di serî de gava ku wî Dîlberê dîti bû, êşeke gelekî mazin bi dîtina wê re keti bû di dilî de. Lê nuha bi wê re êşeke hê mazintir keti bû dilê wî de.

Mihemed gava ku nûçeya wan dihilde, dihê devê konê Bedran Beg û bi xemgîniyekê, li aliyê Çiyayê Raz dimeyizêne. Di cihê xwe de ma bû û hema wilo bédengî ew ji wir biribû. Di serê xwe de weke ku ne li wir be xembar dimeyizand. Çavên wî weke ku bi hêsir bin dibiriqandin. Di serê xwe de tiştên ku dîti bûn, di ber çavan xwe de dibûhûrandin. Gava ku dibûhûrand didît ku gelek tişt dîtine û buhurandine. Her tiştê ku dîti bûn ji tiştê ku êş dixiste dilê mirov de bûn. Gava ku wî jî wan tiştan dihanîne bîra xwe, êşeke mazin dikete dilê wî de. Di wê heyamê de dihizire ku di demeke kin de gelek tişt bûhûrandi bûn. Gelek tişt ji aliyê wî ve hati bû dîtin. Tiştên ku dîti bûn, ji tiştên ku li ser kesayetiya wî gelekî û gelekî bandur çêkiri bûn, dihatine xuyakirin. Li ser tiştên ku buhurandi bûn dihizirî û dihizirî. Wilo lê dihat ku her tiştê ku dîti bûn û buhurandi bû, bû bû weke salekê û keti bû ser temenê wî de. Di wê heyamê de jî xwe westayî didît. Tiştên ku wî dîti bûn, gelekî û gelekî ew wastandi bûn. Nuha jî bi wê westandina xwe re li ser latekî rûnişti bû û li amadekariyên derbestkirina Dilşad û Dîlberê dimeyizand. Her weha dimeyizand û dimeyizand. Lê tenê dimeyizand. Bi meyizandinê re di hundurê wî de êş çê di bû û tavzînok di laşê wî de çê dibûn. Her mirovê ku çavên wan şil bûn û digirîn û di ber wî de diçûn û wî ew didîtin, gizlînok di laşê wî de çê dikir. Serma bayê kur, her weha weke ku li dilan bixe,

di wê heyamê de li wî dihat. Di wê dema germ de, weke ku di nav seqema berfê de be, li mirov dihat. Ji aliyê peyivtinê ve û gavavatinê ve ne xwastineke ku gelekî dide westandin, xwe dida nîşandan. Mihemed di gavavêtin û nêzîkatîyên xwe de her weha weke ku xwediyê gavavatin û nêzîkatîyên be, dihate xuyakirin. Tiştên ku dîtî bûn jê re gelekî gran dihatin. Weke ku barekî gelekî gran be û li ser piştta wî be, dihate hîskirin. Dîtî di wê heyamê de barê herî giran bû ji mirov re. Dîtîna bûyerekî gelekî gran. Mirovên ku diçûn û dihatin jî di gavavêtinê xwe de weke ku bêxwastek bin diçûn û dîtahin. Her weha di ser mirov de pêrde xemgîniye xwe berdabû. Xemgîniye di wê heyamê de di dilên de mal avakiri bû. Êş dide û dide.

Mihemed ta ku derbestên Dîlberê û Dilşad bi cih têt kirin li nig wan dimîne. Piştî ku ewan dihêne bi cihkirin û mirovên herêmê jî ku ji bo sersaxiye dihên şînê, nig Bedran Begî, êdî pê de hêzên Bedran Beg karên xwe dikin ku ji wir vegezin. Di nav wan de êdî ji herdu aliyan jî şer ne derdiket. Weke ku rewşeke nû di nav wan de dest pê bike bû bû. Xelkên herêmê Dîlberê û Dilşad di nav xwe de bi cih kiri bûn.

Di roja dawiyê de berî ku Bedran Beg û hêzên wî vegezin, serekeyên herdu eşîran li hev rûniştî bûn. Li wê rûniştina dawiyê ku bi hev re kirin, gelekî gotin û vebêjên girîng ji hev re kiri bûn. Gotin û vebêjên ku weke peymanekê di seran de were girtin, kiri bûn. Hebûna Dilşad û Dîlberê di wê heyamê de gelekî dihate ser zimên. Rewşa ku bi Dilşad û Dîlberê re bûyî, weke bingehekî bû ji wan re. Wê rewşê ji wan re hinek astên mazin dabûn çêkirin. Gava mirov dimeyizand mirov didît ku rêz û nêzîkatî, hizir û mirovatî û xwe weke nêzîkatîyên girîng didan nîşandan di wê astê de. Ji aliyekî divêt

hestiyarî û dilêşandinên mazin xwe didan nîşandan bi wan re. Li wê rewşê wek fêrek dihat meyizandin.

Mihemed gava ku Dilşad û Dîlberê bi cih têt kirin, êdî ew jî karê xwe dike ku ew jî biçûya. Her kes di nav bêdengiyê de xwe dilivand. Tenê dengê firaqên wan dihat di wê heyamê de. Ji wê pê ve çî dengên din ne dihat. Xemgînî bi mirovan re hebû. Bi wê xemgîniya ku bi wan re bû tevdigeriyan. Mihemed jî bêdeng bû. Hespê ku ew pê hati bû, li nig hespên serekeyan bû. Gava ku mirovên ku sereke ji cihê xwe dirabin ku herine ber bi hespên xwe ve, di wê heyamê de Mihemed di cihê xwe de dimîne. Mirovên din yên ku pê re ne hinekî jê dibuhurin. Lê yekî kal ku sereke bû ew jî li paş dimîne. Li Mihemed zivîri da ku têbigehê ku ka ma çima wî xwe li paş hêşt. Gava ku li Mihemed dizîvire, êdî weke du se gavan jî diavejê û ber bi wî ve diçe. Gava ku digihê dehma wî dipirsiyê: 'Mirove hêja çima li paş mayî?' Mihemed serê xwe pêşikê dike ber xwe ve û hinekî li erdê dimeyizêne. Pişt re serê xwe dirake û dibejiyê: 'Li vîr wê reya me wê ji hev veqete. Ez ê çime Cizîra Bota. Ez li ser riya Cizîra Bota me.' Gava ku Mihemed ev yek ji wî re got, wî jî weke bêhneke di cihê xwe de ma û paşê jê re her weha got: 'Ê nexwe wê riya me li vir ji hev veqete. Bi dilê me ye ku tu bi me re werî. Lê tu dibêjî ez ê herim.. Nexwe ka bêjê ji min re, te çî pêwîstiyek, pêdiviyek heye yan na?' Mihemed li hevberê vê gotinê her weha dibêjê: 'Na berxwudar bî. Tiştê ne gerek e, ez tiştê na vîm. Tiştê ku ez divîm bi min re heye. Ji we re riya wa vekirî be!' Piştî ku Mihemed van gotinan kirin, êdî yê serekê jî li wî dizîvire û dibêjiyê: 'Riya te jî bila vekirî be! Kengî riya te bi vî aliyê ve keve, wî çaxî li ser ser û ser çavan were! Me di demeke zor de hevdu nas kir. Tu jî di wê demê de amade bûyi. Me bi hev re gelek tiştên bi êş û zor dîtin. Wan tiştên ku me dîtin di dilê

me de êşeke mazin berda. Li ser te ji her weha weke ku ez dibînim bandûreke pir mazin berdaye. Xwuda carekê din tiştên her weha ne hêne serê me. Tiştên ku bûn gelekî û gelekî tiştên bi êş bûn. Li vir me gelek tişt bi hev re jiya. Weke tu jî dibînî, ku ev mirov tev ji bo şer hati bûn. Lê şer ne bû. Ji dêla şer her weha rewşeke ku bêşer be hat holê. Ev rewş wê hebûna xwe berdewam bike. Ji î roj pê de jî ji bo ku çî rewşên din ên weha ne yêne jînkirin, em ê tevbigerin. Weke ku te jî dît, ku rewşa Dîlber û Dilşad wê bûba bingeha şerekî mazin di nav van herêman de, lê supasî ji Xwedê re ev ne bû. Ev ji me re tiştêkî gelekî girîng e. Van mirovan hemû yê hev in. Lê bi nêzîkatiyên xirab re hatine hanîn li ber hevdu ku bi hevdu re her dem şer bikin. Lê ne kirin. Wê ev rewş çî careke ne yê ji bîrkirin.’ Gava ku yê sereke dipeyivî û axiftina xwe hew kir, êdî Mihemed jî ji wî re peyivî: ‘Te di dawiya gotina xwe de wê çî carî ev rewş ne yê jibîrkirin got. Rast e, wê çî carî ne yê jibîrkirin. Wan mirovên li vir ku ev rewş dît in ew û zarokên wan çî carî wê jibîr ne kin. Tiştê ku rast be û rast bûbe wê çî carekî jî ne yê jibîrkirin. Ev rewş dilê mirovan pir êşand. Ew dilêşandin wê her û her bimîne.’ Piştî wan gotinan re Mihemed ji wî xatirê xwe dixwaze û diçe ji Bedran Beg û serekên din jî xatirê xwe dixwaze ku bikeve ser riya Cizîra Bota.

Lê Mihemed gelekî dihizirî. Li ser ruyê wî kêf ne dihate dît in. Ketî bû nav bédengiyêke kûr. Di serê xwe de bi bêhtirî jî tiştên ku rû dabûn û ew dîtî bûn û bihîstibûn hebûn. Tiştên ku li ser wan dihizirî ji tiştên ku di wê dema kin de ku bi Dilşad û Dîlberê re bûbûn. Gelekî wan rewşan li ser wî bandûreke mazin kiri bû. Rewşa Dîlberê hîç û hîç ji ber çavên wî ne diçû. Gava ku di rê de diçû jî, weke ku di serê xwe de carekê li nig wê be û pê re bipeyive lê dihat. Her cara ku ew dihate ber çavên wî, ew bêhiş dikir. Ji malê derketî bû ku here Cizîra

Bota. Lê li ser riya xwe de gelek tiştên ku li ser wî bandûr kiri bûn, jiya bû. Nuha jî di serê wî de tiştên ku dîtî bûn û bihîsti bûn dagirtî bû.

di riya xwe de diçû û diçû. Her ku diçû û çiya, kaş û gir li pey xwe dihiştin jî, ji wê rewşa ku jiyabû û dîtî bû dûr ne diket. Di gelek cihên xweş de diçû. Lê hişê wî ne li ser wan cihan bû. Weke ku qet ne dîtî be û diçû. Li gelek cihan ji dirawestiya û bêhna xwe distand. Lê dîsan tiştên ku di serê wî de bûn wî bêkêf dikirin û ne dihiştin, ku kêfe bistêne ji dîtina wan cihên xweş ku tê re diçû. Dilxweşbûn hinekî rehetiya di dil û serî de dixwaze. Lê ew bi xwe re di dil û serê xwe de ne dilfireh bû di wê heyamê de. Ji ber vê yekê jî ne bi kêf bû. Li cihên ku Lê rasiwetiya jî, bêhtir ne dima. Her weha weke heyamekê dima û dîsan dikete ser riya xwe de û diçû. Gava ku dirûnişt jî weke kêlîkeke bêhna xwe distand û hinekî ku di xwe de bidîtina li pirtûkên xwe yên ku pê re ne binere. Ji mêj ve ew ne vekiri bû jî. Ji hizirandine pê ve tişteke din ne dikir. Cihên ku tê re diçû jî, tev daristan û cengel bûn.

Di çol û beyarên tenha de tek û tenê diçû. Mihemed her weha gelek rê diçe. Lê ji ber hizrên di serê xwe de ni zani bû ku çend dirêj yan kurt rê çûye. Mihemed gava ku digihê dehma herêmê, ku dibêjinê de Midihê û ji wir ber bi herêma ku dibêjinê Koze ve diçe. Li wir rastî mirovekî jî têt. Mirove ku lê rast tê jî, mirovekî ku keşe bû. Gava Mihemed digihê dehma wî slav lê dide. Ew jî slava Mihemed lê vedigerîne û li ber hev dirawestin û bi hev re dipeyivin. Mihemed gava ku li ber wî diraweste, jê dipirse ku ew kê ye û wê here ku derê. Keşe bersiva wî dide û dibêj: 'Ez bi navê xwe re Tuma me. Ez keşê dera herêma Colemergê me. Ez ji nig metran dihêm û ez ê nuha jî herime Cizîra Bota. Ez ê li derên wê herêmê jî hinek



bimînim û pişt re ez ê vegerim herêma xwe. Gava ku ez hatim ji nig metran ez çûme dera Deyrûlzafaranê. Paşê ez ji wir hatime Midyadê. Li wir jî li dera Şûryan mam. Nuha vêca wek tu dibînî, ku ez di rê de me û ez ê herime Cizîra Bota.’ Mihemed gava ku weha li keşê hesand, ji wî re got: ‘Ez jî diçime Cizîra Bota.’ Piştî ve gotinê Mihemed hinekî bêdeng ma û pişt re her weha berdewam kir: ‘Ez jî ji herêma Colemêrgê dihêm û ez ê herime Cizîra Bota. Ev demeke dirêj e, ku ez di rê de me. Ez ê riya xwe ber bi Kozê dixim û ez ê ji wir herîm. Her weha ez hinekî riya xwe dizivirênim.’ Gava ku Mihemed weha ev yek ji keşê re got, êdî keşe jî lê zivirî û gotiyê: ‘Tu dikarî di riyên din re jî herî. Hingê wê riya te kin be. Lê weke ez dibînim, ku tu mirovekî zane û seyda yî. Her weha ez û tu em riya Cizîra Bota ji xwe re bikin yek û em bi hev re herin wir. Ez ê jî çime Cizîra Bota.’ Piştî vê gotinê, Mihemed gote keşê: ‘Bila, em bi hev re herin. Mihemed û keşe gava ku dane rex hevdu û çûn, di wê heyamê de keşe fahm kir ku Mihemed bêhtir jî bi xwezayê re mijûl e. Li bin darekê Mihemed rûnişt û li teyrikan dimeyizend. Weke ku ji wan re bilefze û bivizêne deng derdixe. Yê keşe jî li hevberê vê tevgera Mihemed xwe na gire û jê re dibêje: ‘Ez dibêjim qey tu hez ji teyrikan dikî.’ Mihemed her weha bi serhejandinê pirsra wî jê re herê dike û paşê dibêje: ‘Ew jî bi rih in û zimanê wan jî heye.’ Piştî ku Mihemed ev yek dibêjê, êdî keşe jî jê re dibêjê; ‘ê nexwe ez dikarim bêjim ku tu ji zimanê wan fêhm dikî.’ Mihemed li hevberê vê gotina wî weke ku hinekî bibêşişe û lê dimeyizêne û bi kurtî dibejiyê: ‘Herê.’ Pişt re herdu careke din dane ser riya xwe û bi hev re ketine ser riya kozê de. Koze herêmeke mazin e. Lê herêmeke ku gelekî hêrişên leşkerên osmaniyan lê bûne. Ji berê ve navê wê herême Koze bû. Lê ji ber hêrişên ku lê bû bûn û xelkên herême

gelek hati bûn kuştin, êdî bûbû herêmeke bêmirov û mabû. Ji ber vê yekê jî xelkê dora wê derê jî navê wê derê kiri bûn Koza Xirab yan jî Xirabekoze. Paşê pir xelk ji herêmên din malên xwe bar dikin wê derê. Bi vê yekê re carekê din mal lê ava dibin. Ji wan gûndan re jî tê gotin Gûnden li Xirabekoze yan jî rast û rast Xirabekoze. Lê hinek ji wan mirovên wê herêmê jî ji hêrişan rizgar dibin. Di herêm tev daristan e. Darên çilo yan jî darên din hebûn. Ew jî ji mirovan re dibin stareke mazin.

Mihemed gelekî tişt der heqê wan herêmên de bihîstibû. Tiştên ku wî seh kiri bû jî, ji wan kesên ku ji wê herêmê bazda bûn çû bûn wê herêma ku ew lê bû. Lê di wê heyamê de ew bi xwe li ser riya wir de bû ku here wir û wan deran bi çavên xwe bibîne. Mihemed gava ku dikeve ser wê riya xwe, her weha tiştên ku seh kiri bûn jî di mejiyê wî de dibuhurîn. Gava ku bi keşe re diçû, car bi car jî keşe jê dipirsi û wî jî bersiv dida wî û dipeyivîn. Lê ji wê pê de ji ne dipeyivîn. Mihemed gelekî bi hizir dihate xuyakirin. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku gelekî di hûdûre xwe de bi hizire. Mihemed û keşe ku weke heyamekê bi hev re diherin, êdî weke ku digihine nêzîki ber Xirabekozê. Gava ku digihenê de û malên ji dût ve dibînin, hinekî ji gund dût kahniyekê li pêşiya wan derdikeve. Gava ku ew jî digihîjin ser kahniyê, hinekî li ser dimînin û bêhne xwe distînin. Di wê heyamê de jî, hinek kesên ku wan dibînin ber bi wan ve dihên. Gava ku mirov ber bi wan ve dihên, slavê li wan didin û li nig hevdu hinekî dirûnin. Bi hevdu naskirinê re bi hev re dest bi peyivtinê dikin. Gava ku mirovên herêmê têne nig wan û hinekî bi wan re dipeyivin, êdî ew dihildin û dibin malên ku wan li xwe dikin mêhvan. Ew jî gava ku gundî dixwazin wan bibine malê, êdî bi wan re diçin. Lê gava ku diçin jî, bêhtir na mînin. Gava ku ew digihîjin ser

kahniyê, dema ber êvarê bû. Diçine malê hinekî dirûnin, xwarinê jî ji wan re dihênin û xwarina xwe dixûn, piştî hinekî bêhna xwe jî diberdin, êdî karê xwe dikin ku herin. Xwedyê malê dibêjê wan divêt hûn bimênin ku ta şîva we jî were amadekirin û bixûn û pişt re em dixwazin ku hûn i şev jî li vir bin. Lê Mihemed vê yekê herê na ke. Ew bi xwe dibêjê, divêt ku em herin, da ku em zû xwe bigihinine cihê ku em ê hernê. Xwedyê malê çend dike na ke ni kare ku wan bide rawestandin. Gava ku xwedyê malê ni kare wan bide rawestandin, ji her yekê wan re turikekî ku tiştên ku di re de ji wan re bikêr were, ji bo xwarinê dide amadekirin û dide wan. Mihemed di wê heyamê de dixwast ku ew xwe bigihîne herêma Ayserê. Herêma Ayserê herêma ku gelekî xweş bû. Li wir ji xwendegeheke mazinbû hebû. Di herêma de jî navê wê xwendegehê derketi bû. Navê wê xwendegehê bi navê herêma re yek dihate ser ziman. Mihemed jî navê wê derê bihîsti bû. Ji Mihemed re ji hati bû gotin, ku gelek mirovên zane li wê derê diman. Ayserê bêhtir ji Cizîra Bota ne dîr bû. Gava ku wan xwe gihandiba Ayserê, êdî weke ku wan xwe gihandibana Cizîra Bota. Lê yê ku di serê Mihemed de bû ew bû ku xwe gihandiba wê derê û wê derê jî bidîta.

Bi vî awayî Mihemed û keşe bi hev re ji Xirabekoze derdikevin û diçine ber bi Ayserê ve. Riya wan ji Xirabekoze ta Ayserê ne dirêj bû. Gava ku hinekî daban lezê, wê hê bêhtir li wan ne bûye reş, wê xwe gihandiban wê derê. Her weha ew jî dikevîne rê de û hinekî lezê didine xwe da ku hinekî zûtir herin û bigihin Ayserê. Di rê de gava ku di serê xwe de mirov biryar da ku mirov here derekî, êdî li ber çavên mirov wast na mîne. Mirov bi wast jî be, dîsan mirov xwe ji riya xwe na ke. Her weha wan jî biryara xwe dabû û keti bûne ser

rê da ku herine cihê ku wê hernê. Mihemed û keşe gava ku dikevine ser rê de, êdî bi lezê diçin û di hundurê demeke kin de xwe digehînin ber Girê Elim. Gava ku ewan digehin ber gir, êdî weke ku wan riya xwe nîv bi nîv kiri be têt jimartin. Êdî weke ku gihibin.. Lê hê bi yekcarî jî ne giha bûn. Diviya bû ku hê hinekî din jî biçûna. Mihemed wan deran bêhtir nas dikir. Ji nûke ve dihate wan deran. Lê keşe jî wan deran baş û qenc nas dikir. Gava ku ji Xirabekoze bi rê dikevin, Mihemed zani bû ku wê bi kîjan aliyê ve herin. Wî di serê xwe de riya xwe zani bû. Keşe wan deran berê jî dîtî bûn. Ji Mihemed hê bêhtir wan deran nas dikir. Hê ku li Xirabekoze bûn, gava ku xwediyê malê ji wan pirsî bû, ku wê çine ku derê, digot wê herin dêrê ku keşe gotibû ku 'ez nas dikim.' Mihemed dihizirî ku xwe gihandiban Ayserê, êdî wê ji wan re xweştir ba. Ji wir pê de wê ne bûba zor ji wî re. Vê yekê wî jî zani bû. Ji Ayserê mirovên ku dihatin û diçûn gelek bûn. Ji ber wê yekê jî wê mirov rê şanî wan dabana. Keşe jî rê nasdikir û wan bi hev re gotina xwe kiri bûn ku wê ta Cizîra Bota bi hev re çûban. Mihemed van hizra hê berî ku bigihan herêmê di serê xwe de çê kiri bû. Lê nuha hevaleyê wî ku ew herêmê baş nas dikir hebû. Li herêmê, li gelek cihên deran hebûn ji ber vê yekê jî keşe Tuma li hemûkan jî geriya bû. Bi vê yekê re mirov hem hevdu nas dikir û hem jî herêma ku diçûnê nas dikirin. Li dora Cizîra Bota û li navenda wê xelkê fileh hebûn. Mirovê êzdî ji hebûn. Li Cizîra Bota û li hinekî jê wir de û weke navendeke mazin dihate dîtin, Nisêbîn hebû. Li wan deran û li dora wan deran jî êzdî û fileh hebûn. Her weha xelkê ji olên cuda li nig hevdu bûn û bi hev re gelekî xweş û baş dijiyan. Ku çûban herêma hevdu û li hevdu nebûba mêhvan, dilê wan ji hev dima. Ji ber vê yekê jî gava ku diçûne herêmên hevdu, diviya bû ku hevdu jî bidîtina. Di vir de hêja ye ku divêt mirov

bêjê, ku ji navenda Cizîra Bota, ta navenda Nisêbînê Riya Hevrîşimê diçû. Riya Hevrîşimê riyeke gelek cengê wê yên ku diçûne herêmên din jî hebûn. Herêma Ayserê diket di navbera Girê Elim û Riya Hevrîşimê. Lê gava ku rast û rast mirov ji Ayserê diçû ser Riya Hevrîşimê û hinekî jî di rê de mirov diçû bi aliyê Cizîra Bota ve, mirov digiha çemê Zergûzê. çemê Zergûze çemekî ku ava wê gelekî xweş bû. Li ber çem darên behîvan û tûyan hebûn. Hinek darên bearuyan ji hebûn. Lê ne bêhtir. mirov malên xwe nêzîki wê ave çê kiri bûn. Bi malan ve û nêzîki avê ve jî rez û warz hati bûn danîn. Ayserê jî ji wan herêman ne dûr bû. Mirovên ku li wê herêmê dijiyan, zadên xwe her weha baş dihildan. Ew herêm herêmêke têrav bû. Ji ber vê yekê jî çî pirsgirek di jiyanê de her weha ji aliyê avê ve bi wan re ne bûn. Çandin ji her aliyê ve pêk dihat. Bi vê yekê re her weha divêt ku mirov bêjê, derûniya mirov gelekî baş bû. Mihemed û keşe Tuma jî gava ku digihîjine dehma Ayserê, her weha rastî xelkê dihên û vê yekê ji baş û qenc fahm dikin. Mirovên wê herêmê her weha mirov dikarê bêjê ku pêşketî bûn. Têrbûn bi mirov re bi her awayî xwe dida nîşandan. Bi vê yekê re mirovên wê herêmê, ji aliyê çivaknasiyê ve jî gelekî li pêş bûn. Hêja ye ku mirov bêjê ji aliyê zad ve gelekî dewlemend bûn. Ji aliyê kevneşopiyan ve jî tevgerên wan gelek kevn bûn. Her weha di her demê de gava ku paletî hew dibû şahî dikirin û bi hev re govend digirtin. Mirovên ku paletî hew dikirin, êdî piştî paletiyê re weke demeke li malên xwe dirûniştin. Di wan deman de jî gelek mirovên ku henekçî bûn, qirdik çê dikirin an jî cimezî dixemilandin û mal bi mal digeriyan ji xwe re tişt didane hevdu. Mirov gava bi qirdik re hatina devê deriyê malekê, diviya bû ku tiştêkî bihatina dayin. Ev dayin jî weke kevneşopiyekê dihate dîtin. Dayin jî xeynî kevneşopiyê dihate wateya ku zadên xwe ji erdê

rakirine û sala wan, ji bo wan baş çûye. Lê hinek herêman jî her weha bi qirdik re gerandin dihate kirin. Mirov di dema şahiyê de tişt bi destên xwe çê dikirin û dihanîne ber mirov. Her weha jiyaneke ku xwezayî bû, di nav mirovan de hebûna xwe berdewam dikir. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêjê ku derûniya mirov gelekî geş û zindî bû. Gava li ruyê mirov dihate meyizandin, ev yek baş dihate dîtin. Kulên jiyane her weha bêhtir bi mirov re ne bûn.

Mirov di demên şahîyan de di wê salê de çî çandiba, ji wan tiştên jî didane ber mirov amade bû bûn. Her weha ev yekê weke serbilindiyekê dihate dîtin. Her borînkirin û keremkirin jî, bi hev re di wê rewşê de dibû. Mirov ku bihatina bûrînkirin, diviya bû ku kerem bike. Ev yek hem ji bo rûmeta xwediyê malê bi wate bû. Xwediyê malê ew dawêt dikir, her weha erê dîkir. Bi vê yekê re nêzîkatiyên di nav xwe de xurt dikirin. Hevnaskirin jî her weha xurt dibû. Di wan rewşan de mirovên ku rewşa wan xweş bû, dilxweş bûn. Lê yên ku rewşa wan ji ber hinek sedemên xwezayî ne baş çûba, êdî diviya bû ku yên ku rewşa wan baş ba, alîkariya wan bikira. Bi wê alîkariyê re, wan jî êdî di rewşa xwe de, hin bi hin rastkirin çê dikirin. Ku rewşa yekî ne xweş ba û yên din ji li hevberê wê rewşa wî bêxem maba, ev mayin weke bêrûmetiyekê dihate dîtin. Mirov di wê rewşê de, ew yek çî carî jî, ji bîr ne dikir. Her cara ku hati ba bîra wan jî, ji wî mirovê ku bêxem mabû re ji bêxêrî dihate xwastin. Mirov êdî bi nêzîkatiyên xwe re di her rewşê de ew yekê li ruyê wî didan. Mirovên ku rewşa wan ne gelekî giran ba, bêhtir ne dihanîne ser zimên. Bi nêzîkatiyên xwe re ku dihatine hevberê wî, tevgerên wî dihanîne bîra wî. Di vê rewşê de jî gava ku mirov didît ku her weha bi nêzîkatiyan re hat dayin li ruyê wî, êdî yên ku xwe ne girtiban jî, bi devkî didane ruyê wî. Lê piranî jî, di rewşên weha de,

diketine devê henekçiyân. Ev jî gelekî dibû sedemê ku mirov bi pêkenînan jî dihatine rexnekirin. Navlêkirin her weha bi du aliyan dibû. Bi aliyê baş dibû û bi aliyê nebaş dibû. Di rewşên wisa de jî, mirov çî cari ne dixwast, ku navekî nebaş hilde. Mirov ji vê yekê re digotin 'rastnav.' Rastnav jî bi rewşên ku rû didan çê dibû. Di vir de divêt mirov bêjê, ku rastnav di jînkirina wan rewşan de nêzîkatî û helwêsta mirov çawa ba, li gor wê çê dibû. Di bingeha van rewşên hemûken de jî, demên karkirina zadgirtinê jî hebûn. Her weha çî mirov ne dixwastin ku rastnavekî wan yê nebaş hebe. Ji ber ku rastnavekî wan heba, ku baş ba yan jî nebaş, êdî wê li ser wan sax ba. Di nav civakê de ev bûbû xwediyê hebûneke baş di negirtina rastnavekî nebaş. Her weha jiyana mirov bi nêzîkatiyên xwe re, li ber çavên henekçiyân jî bû. Wan henekçiyân, li her mirovî baş û qenc dimeyizandin ku ka ma çî taybetmendiyan wan hene. Taybetmendiyan ku dîti ban, dihanîne ser ziman. Ve rewşê dikir ku mirov di nav civakê de ji her aliyê ve xwe zindî bigrin û xwe bêxiyret ne hişti ban Ji aliyekî din ve jî dibû bingeha jînbûnekê di nav xelkê de. Mirov bi zanebûn li jiyana hevdu dimeyizandin. Mirov bi hizir re gavên xwe diavêtin. Bi hizir gavavêtin di bingeha xwe de tegihîştin diparast. Ew têgehîştin jî bi bêhtirî ji aliyê civaknasiyê ve bi wate bû. Wekî din jî ji aliyê civaknasiyê ve jî ber bi rehetbûneke ve dihat. Her weha mirov dikari bû bêjê ku di nav mxelkê de pêşketineke mazin hebû. Bi civaknasî, bi hizir û têgehîştin û hebûna mirov bi hev re re xwe ber bi pêş dibe. Ji aliyê din ve jî bi mirovên ku li ser axa xwe be û li ser axa xwe bijî, pêş dikeve. Divêt ku mirov bêjê ku ax, mirov û hizir bi hev re di bingeha civaknasiya çivakî de, xwediyê wateyan mazin in. Mirov di demên pêşketinên xwe de gelek xalên mazin derdixistine holê û pê pêşdiketin. Di vir de xalên

herî mazin bi naskirina di nav civakê de çê dibû. Pêşî erdê ku li ser dijiyan naskirin çêdibû. Pişt re mirovên ku li ser wê erdê ku bi wî re di rex hev de dijîn, hevdu didîtin û nas dikirin. Pişt re jî bi vê yekê re di şeran de bi naskirinê re têgehîştin çê dibû. Bi naskirinê re mirov dihatin nig hevdu. Bi hatinê nig hevdu re ji navbera wan çê dibû. Di vê navberê de jî civaknasiya wan ya çivakî pêş diket. Her weha di vê xalê de êdî bi têgihîştinê re jînbûn dibû û pêşketin çê dibû.

Mihemed û keşe Tuma piştî ku gihabûne Girê Elim û ji Girê Elim derbas bû bûn, êdî weke hinekî din jî rê çûbûn û gihabûne Ayserê. Gava ku digihine Ayserê, êdî hinekî behna wan fireh dibe. Lê gava ku gehîştinwir ji reşayî keti bû erdê. Lê hê bêhtir jî reş ne bû bû. Mihemed û keşe Tuma gava ku digihijine Ayserê, êdî di nav malan de gava ku diherin, li yekî digeriyan ku jê bipirsin ku wê li ku derê bimana. Gava ku hinek di nav malan de diçin, rastî hinek mirovan dihên. Mirovên ku rastê wan dihên jî, mirovên ku li malên xwe şivên xwe xwari bûn û ji malên xwe derdiketin ku wê herine malan ku civat lê hebû. Gava ku digihîjine dehma slavê didine hevdu, hev didine naskirin. Gava ku bi hevdu re dest bi axiftinê dikin, pêşîkê Mihemed dipeyive. Gava ku Mihemed xwe dide naskirin êdî keşe Tuma jî xwe dide naskirin. Mirovên ku wan dibînin, wan li wir na hêlin. Li wan dibine xwedî û wan bi xwe re dibine cihê ku wê çinê. Pêşîkê hevdu nasdikin û didine rex hevdu û diçin ku bi hev re herne mala civatê. Gava ku diçin di rê de wan mirovên ku rastî wan hati bûn, ji wan dipirsin ku ji ku derê hatine. Mihemed ji wan re dibêjê ku ew ji aliyê Colemêrgê hatiye û feqi ye û hatiye ku here Cizîra Bota. Her weha keşe Tuma jî xwe dide naskirin û dibêjê ku ji Colemêrgê hatiye ku here ber bi Cizîra Bota ve. Piştî li wan dihesênin, êdî dibêjine wan: 'Hûn bi xêr hatin' û ew didine rex xwe



û dibine mala civatê. Gava ku di re de diçin, ji car bi car jî, mirovên ku ew dabûn rex xwe de, ji wan pirsan dipirsin der heqê riya wan ku jê hati bûn. Wan jî li gor zanebûna xwe bersiva wan didan. Her weha bi axiftina weke heyamekê diherin û êdî digehîjin cihê ku wê werinê. Gava ku digiîjin wê derê, mirovên, ku wan bi xwe re hanibûn, di devê deriyê hawse de pêşîkê re didine wan û wan dibuhurînin hundurû. Ji ber ku ew diyar bû ku ji dûrî ve hati bûn. Gava ku diçine hundurû, dimeyizênin, ku wa ye civat li dar e û gelek mirov di rex hevdu rûniştine û bi hev re dipeyvîn. Gelek ji wan mirovan jî mirov kal û navser dihatine xuyakirin. Lê mirovên ciwan jî dihatine xuyakirin. Jin jî di civatê de hebûn. Lê bêhtirî mêr bûn. Gava ku Mihemed û keşe Tuma ketine hundurû de, pêşîkê slava xwe dan civatê û pişt wan bûrîn kirine rûniştinê. Gava ku dirûnihên, pêşîkê civat hinekî bêdeng dimînin û li wan dimeyizênin. Pişt re yek careke din dibêje wan; 'hûn bi xêr hatin' û bi wan re dest bi axiftinê dike. Yê ku bi wan re pêşîkê dipeyive xwediyê malê bû. Navê wî ji digotinê de Rame Beg. Rame Beg mirovekî ji mala axê bû. Lê ew bi xwe jî wek yekî ji rêzê bû. Çi wasf di wê heyamê de destê wî de ne bû. Rame Beg se birayên wî yên dî ji hebûn ew jî her yek li ser herêmekê diman. Rame Beg jî her weha li herêma Ayserê dima. Ew bi xwe jî bêhtir ne ewçendî kal bû. Gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku weke mirovekî ciwan dihate xuyakirin. Mirovekî ku hinekî gir bû û hinekî jî dirêj bû. Simbêlên wî qaytan bûn. Cilên ku lê bûn ji cilên ji ye cizîriyan ne cuda bûn. Lê cilên bega lê bûn. Ji ber vê yekê jî ji rewşa wî dihate têgehîştin ku ji malekî mazin bû. Çavên wî hinekî gir bûn. Rûdana wî vekirî bû û heiya wî li gor rûdana wî fireh dihate xuyakirin. Ew bi xwe jî di nav nêvê civatê de rûnişti bû û hinek mirovên ku ku kal bûn, li aliyê wî yê çepê û û rastê rûniştî

bûn. Ew mirovê zane dihatine xuyakirin. Rame Beg ne dûrî Mîrê Cizîra Bota bû. Di wê demê de jî digotin ku li Cizîra Bota Tacdin Beg bû bû mir. Tacdin Beg nû bû bû mîr û navbera wî û Rame Beg gelekî xweş bû. Dihate gotin ku herdûk ji aliyê malê ve digehan hevdu. Dayika Rame Beg bi malbaviya xwe ve digeha mala mirê mazin. Ew jî bi navê xwe digotinê Sêvê. Di keçkaniya xwe de gelekî xweşik bû. Çavên wê mazin û her dem jî bi kil bûn. Lê Sêvê di wê heyamê de gelekî pîr bû bû û piştî ku hevalê wê yê jiyane koçê dawiyê kiri bû, ew jî diçe Cizîra Bota û li wir dimêne. Rame Beg bi xwe jî dibû kurê Sêvê û Zengal Axa. Zengal Axa jî axayê cengek ji eşîra botiyan bû. Mirovekî gelekî zane bû û bi başbûna xwe ve dihate naskirin. Ew jî ji xwe di wê heyamê de ne dima. Giha bû ber dilovaniya Xwedê. Gava ku ew digihîjê ber dilovaniyê, êdî kurê wî ye herî mazin ku bi navê wê Rûbar Beg bû, keti bû dewsa wî de. Rûbar Beg jî berî ku bavê wî bigehê ber dilovaniyê, ew şandi bû Cizîra Bota ji bo ku fêrbûneke baş û qenc hilde. Rûbar Beg ji aliyê dayika xwe ve her weha dibû xwarzê Mîrê Bota Tacdîn Beg. Ta ku bavê wî digehîje ber dilovaniyê, ew jî li nig mala xalanê xwe dimîne û fêrbûna xwe li nig wan dike. Cihê ku Rûbar beg lê bû, di wê demê de nêzîkê herêmê Hezexê bû. Bi vê yekê re, hinekî ji Cizîra Bota dûrketi bû. Rûbar Beg her dem bi mirê mazin re gavên xwe diavêtin. Mirê mazin jî gelekî alîkarî didayê. Her weha Rame Beg jî alîkariyeke mazin ji qesra mîr distand. Di her hêrişên ku bûba, artêşa mirê mazin li nig wî bû. Ji ber vê yekê jî mirov ku xwasti ba hêriş kiri bana ser Rame Beg, bêhtir ne diwêrîn. Hebûna Mîrê Mazin, Mîrê Bota û nêzîkbûna wan ji hev re, ji Rame Beg re dibû bingehê mazin ji bo ewlekariyê. Mirov ku xwastiba hêriş biriba ser wî jî, bi vê yekê ne diwêrîn.

Bi vî awayî gava ku li Rame beg dihate meyizandin, dihate dîtin ku mirovekî gelekî xurt bû. Gava ku Mihemed û keşe Tuma çûbûn di nav civatê de rûnişti bûn, ji peyvên û nêrînên Rame Beg zû fahm kiri bûn. Fahmkiri bûn ku Rame Beg mirovekî beg bû. Lê waxta ku rûniştî bûn, hê bi wî re bêhtir çî gotûbej ji ne hati bû kirin. Her weha Mihemed ji û keşe Tuma jî di cihê xwe de hema wilo rûniştî bûn û li wan mirovên ku dipeyvîn dimeyizandin û dihesandin. Mirovên ku dipeyvîn jî, mirovên ku navsere bûn û zani bûn, ku bipeyivin û mirov li xwe bidine hesandin. Mirovên ku li dora wan jî didipeyvîn ji pir bi balû serinc li wan dimeyizandin û dihesandin. Rame Beg ji gava ku ew dipeyvîn, li wan gudar dibû. Biguhbûna wî bi xwe re biguhbûna civatê li wan dihanî. Rame Beg her weha hinekî bitesîr dihate xuyakirin. Hesandin û guhdarkirin bêguman di wê rewşê de girîng bû. Weke rûmetdayineke dihate dîtin. Li wan mirovên navser hesandin, rêzekî dida mirov. Mirovên ku li wan dihesand, bi xwe re weke ku hêz bibînin li wan dihat. Ji ber vê yekê jî pir baş û mazin agehdarî bi mirovan re çêdibû.

Rame Beg weke heyamekê li wan mirovên ku dipeyvîn dihesênê, êdî berê xwe dide Mihemed û keşe Tuma û bi wan re dipeyive. Rame Beg gava ku bi wan re destt bi axiftinê dike, pêşîkê hinekî behsa xwe û mirovên li dora xwe dike. Bi vê yekê re jî nêrînên ku Mihemed der heqê wî û civatê de girti bûn, di serê wî de tam dirûnê. Pişt re Mihemed ku Rame Beg axiftinê hew dike, êdî ew dest bi axiftinan dike. Gava ku dest bi axiftinê dike, pêşîkê hinek behsa xwe û herêma ku jê hatiye dike. Gava ku mirov her weha lê dihesandin fahm dikirin ku ew mirov xwedî zanebûn e. Di wê heyamê de hinek seyda di civatê de amade bûn. Gava ku Mihemed dest bi axiftinê kiri bû û axiftine xwe ye pêşîkê hew kiri bû êdî pê de

weke heyameke axiftin di navbera wî û wan sedayan de çê bû bû. Wan sedayan jî, ji wî hinek pirsên xwe pirsî bûn û wî jî bersiva wan dabû. Piştî vê yekê, mirov fahm kir ku Mihemed mirovekî zane ye. Piştî vê yekê gelek axiftin di navbera wî û wan seydayan de çê bû. Car bi car keşe jî bi zanebûna xwe re tevlî guftûgoyan dibû. Lê bi bêhtirî jî guftûgoyên di navbera Mihemed û wan sedayên din de dibuhurt. Seydayên ku amade bûn, mirovên ku hinekî navserê xwe bûn û bi zanebûn bûn. Ji ber vê yekê jî di serî de wan guftûgo di nav xwe de berdewan kiri bû. Mihemed hingê ji wan re hinekî ciwan hati bû. Gava ku li rewşê wî jî dimeyizandin, digotin qey ku Mihemed mirovekî ku ji nûke ve dest pê kiriye. Lê Mihemed ji dema ciwaniya derketi bû û mirovekî ku gelek tişt jî dîti bûn. Di kesayetiya wî de jî, rûniştineke mazin xwe dida nîşandan.. Her weha weke demeke dirêj ji Mihemed û seydayên din di nav xwe di dipeyivîn û guftugo dikirin. Di nav axiftinan de gava ku navê seydayê wî ji devê wî derdikeve, êdî mirov hê bêhtir bala xwe dabûn ser wî. Mirov navê seydayê wî bihîstibûn. Zanibûn ku mirovekî ku çend bi zanebûn e. Bi vê yekê re êdî Mihemed li wir bi zanebûn dihat naskirin. Mirovê ku li wir bûn û seyda bûn, gelek ji wan bi Melayê Cizîrî re jî ma bûn. Gava ku behsa Melayê Cizîrî di nav axiftinan de têt holê, êdî bala Mihemed jî hê bêhtir diçe ser wan mirovên ku behsa wî dikirin. Navê Melayê Cizîrî jî bi hatina ser ziman re hê bêhtir di serê wî de cih digire. Di wê heyamê de ji wan mirovan ku bi Melayê Cizîrî re mabûn jî hinek gotinên wî weke beytên ji wî re dihênine ser ziman. Ev yek ji bandûreke li ser Mihemed diberde. Mihemed piştî ku her weha bi seydayan re axiftinan dike, êdî seydayên bela xwe ji wî ne vekiri bûn. Êdî berê xwe dabûne wî. Lê Mihemed jî gava ku navê Melayê Cizîrî dibihîze, êdî bala wî jî diçe

ser wan mirovan ku der heqê wî de axiftin kiri bûn. Berê jî der heqê Melayê Cizîrî de wî gelek gotin bihîsti bû. Ev yek jî bi wî re dibû bingeha mereqeke pir mazin di serê wî de. Gava ku li ruyê wî dihate meyizandin, dihate dîtin ku mereqeke wî di serê wî de heye. Ji ruyê wî ev yek dihate xwandin. Ji aliyekî dî ve jî gava ku gotina Melayê Cizîrî keti bû holê de, çavên wî weke ku biçirsin li wan hati bû. Her weha çirisandin di çavên wî de dide derve. Mihemed gava ku bahskirina Melayê Cizîrî têt kirin, êdî yên ku bahsa wî kirin, ji bala Mihemed rizgar ne dibûn. Yên ku bahsa Mele Ehmedê Cizîrî kiri bû, goti bû: 'Melayê Cizîrî hê nû demeke kin bû ku hati bû.' Ev peyv di serê wî de meraqek çê kiri bû. Gava ku her weha ye ku ew gotin kiri bû; goti bû: 'Melayê Cizîrî jî nû hatiye.' Pey re jî goti bû 'Melayê Cizîrî ev demek e dirêj bû ku li Amedê bû.' Bi vê yekê re di serê Mihemed de bûbû meraq, êdî wî jî li ser Melayê Cizîrî û Amedê pirsî pirsî bû, ku Melayê Cizîrî çûbû çî Amedê? Her weha seydayê ku bersiv dabûye de jî, ev bersiv jê re welê hanî bû ser zimên: 'Melayê Cizîrî mirovekî gelekî zane bû. Gelekî li ser zanist kûr bû bû. Gelek mirov li nig wî xwandine. Yê Melayê Cizîrî nas dike, dizane ku ji Hasetê ye. Hasetê jî li vir e li Bota ye. Melayê Cizîrî dema xortaniya xwe, yekî ku zû fêr dibû. Ji ber vê yekê jî li nig gelek seydayan digere û zanist û zanebûna wan digire. Di dema xortaniya xwe de gava ku hinekî zanebûna wî mazin dibe, êdî dixwaze hê bêhtir fêr bibe. Bi vê yekê re li gelek herêmên Kurdistan digherê. Diçe herêma Serhede. Diçe herêma Zivingê. Diçe herêma Dêrsimê. Her weha li gelek herêman digherê. Piştî gerandina xwe, xwe digihêne herêma Hêskîfî. Li wê derê jî Şêx Husên heye. Melayê Cizîrî diçe nig wî. Li nig wî jî weke heyamekê dimêne. Lê têne li wir ne na mêne. Gava ku li Nig Şêx Husên dimêne jî, li wan herêmên dora wê derê digere. Li wê

herêmê gava ku digere, di gerandina xwe de diçe nig gelek mirovên zane. Xwe digihêne gelek herêmên din, yên ku mazin bûn. Melayê Cizîrî her weha di dema xwe de, xwe digihêne mirovên zane. Ji wan mirovan jî gelekî fêr dibe. Bi vê yekê re mirov dikarê bêjê, ku mirov ji wan demên wî yên ku di gerandinê de ye, jê fêr dibin. Mirovên herêmê wî baş û qenc nas dikin. Nuha ku tu herî wê herêmê, çi mirovê ku Melayê Cizîrî nas ne ke tu zor bibînî. Her weha Melayê Cizîrî piştî demeke ku digere, êdî pê de careke din divegere nig Şêx Husên, ku li Heskîfê ye. Lê vê cara dawiyê ku divegere, bêhtir li nig Şêx Husên na mîne. Şêx Husên li nig Mele Taha ye. Mele Taha mirovekî gelekî zane ye. Zanista wî jî mazin e. Şêx Husên gelekî hez jê dike. Şêx Husên jî bi bawer e ku zanebûna Mele Taha mazin e. Bi vê yekê re Melayê Cizîrî diçe nig Mele Taha. Mele Taha kirê wî yê şîfakirinê jî heye. Li ser şîfakirinê bi zanebûn e. Mele Taha bi xwe jî di dema feqetiya xwe de hatiye Cizîra Bota û çûye nig Şêxê Çemîşgezê. Şêxê Çemîşgezê mazin têt naskirin. Gava ku Melayê Cizîrî diçe nig Mele Taha, demeke li wir jî dimîne. Gelek tiştan ji wir jî fêr dibe. Di wê herêmê de Mele Taha miroekîv baş û mazin têt naskirin. Rêzê mirovan jê re mazin e. Weke şêxekî bi wate ye ji mirov re. Bi vê yekê re Mele Taha ku demeke Melayê Cizîrî li nig xwe dihêle, êdî Melayê Cizîrî li nig wî dibe Mele. Mele Taha bi xwe li Amadê li Medresa wê derê dimîne û perwerde dide. Lê piştî ku Melayê Cizîrî li nig wî her weha têt wê asta meletiyê, êdî Mele Taha jî wî dişênê gundekî, ku bi navê xwe dibêjinê de Sirba. Li Sirba'yê jî li medresê dihate xwandin. Melayê Cizîrî têt ser serê wê medresê ku perwerde bide. Melayê Cizîrî her weha xwe bi fahm û zanebûn kiriye ku bi wê zanebûna xwe re dibe mele û diçe ser serê medreseyan'

Bi van gotinan re Mihemed hinekî dihizire. Gava ku van gotinan jê re hatin gotin, gelekî li ser wî bandûrekê çê dikin. Mihemed piştî gotinên ku seyda der heqê Melayê Cizîrî de Goti bû, êdî li wî zivirî û dibejyê de: 'Yê min ez ta nuha navê te ni zanim û fahm dikim ku va ye tu mirovekî gelekî bi zanebûn î. Navê te bi xêr?' Piştî vê gotina Mihemed, seyda bi yekcarî xwe li Mihemed zivirand û weke ku bibeşîşe li Mihemed meyizand. Seyda weke bêhneke bêdeng dimêne di cihê xwe de û pişt re dest bi axiftinê dike: 'Weke ku tu jî dibînî, wa ye em gelek seyda li vir li nig hevdu ne. Ez bi xwe jî ne ji vir im. Ez ji herêma Destedarê me. Navê min jî Mele Zeynedîn e. Bavê min û kalkê min ji herêma Qarexirabê bûn. Lê ji aliyê dayikê ve jî ez digehime aliyê Alikan. Dibit ku tu jî dizanî, ku piştî hêrişa osmaniyan diçin ser Alikan êdî hêza wan na mêne. Yên ku difilitin jî xwe dispêrine çiyaye Sipî. Piştî ve rewşê dayika min û bavê min hevdu mar dikin. Mala me nuha li Dastederê ye. Nuha ez li wir mele me jî. Ez nuha hati bûme mala malxalanê xwe, ku wan li Qarexirabê bibînim. Em bi ser hevdu ve diçin. Bi vê yekê re jî divêt ku ez bêjim, ku ev demeke dirêj e ez li vir im. Ev demeke dirêj e jî li Cizîra Bota bûm. Li wir weke demeke li Medresa Sor mam. Melayê Cizîrî û hê gelek mirovên din, yê ku zanistvan i, li wir dimênin. Tu jî ku tu çûyî wir, tu wê wan bibînî, nuha li wir dimînin. Yekê ku dikeve nav wan mirovê zane de, na xwaze êdî ji nav wan derkeve. Piştî ku Melayê Cizîrî hat ji Amedê êdî ez hatim. Ev demeke dirêj e ez li vir li nig wî mirovê mazin im. Lê divêt ez ji kekê xwe re bêjim, ku min berê ji Melayê Cizîrî nas dikir. Bi temen hinekî ji min mazintir e lê ne bêhtir ji mazintir e. Me di dema xortaniya hev de hevdu dîtî bû. Ez hatim û min ew dît û demeke dirêj jî me bi hev re buhurand û nuha jî ez li ser rê me karê xwe dikim, ku vegerime malê. Vêca berî ku ez

vegerim jî careke din ji Cizîra Bota vegeriyam û çûme Qarexirabê û ji wir jî hatime vir. Te jî got ku ez hatime herime Cizîra Bota û te got ku ez ji Colemergê hatime. Da ka vêca tu jî hinekî bêjê û bahsa xwe bike û cihê ku tu jê hatî jî, hinekî ji wir bihêne ser zimên.'

Piştî van gotinên Mele Zeynedîn re, Mihemed hinekî bêdeng ma. Mirovên ku li dora wan bûn, di dema ku Mele Zeynedîn dipeyivî, bêdeng bûn û li wan dihesandin. Di wê heyamê de Mihemed jî li berçavan bû. Mirov hema wilo li wan dimeyzend û dihesand. Mele Zeynedîn, zimanê wî gelekî xweş û şêrîn bû. Gava ku mirov lê dihesand, ne dixwast, ku bala xwe ji ser wî bidine alikî. Gava ku Mele Zeynedîn dipeyivî, weke ku helbesteke bixwêne li mirov dihat. Zani bû gotinê li hev bihêne. Bi vê yekê re divêt mirov bêjê ku zani bû ku gotinên xwe li pey hevdu bike rêz. Di vî aliyê de xwediyê hunerekî bû dihate xuyakirin. Mele Zeynedîn weke ku jê dihate têgehîştin, ku hinekî li ser matematîkê zanebûna wî hebû. Gava ku dipeyivî, di nav gotinên xwe de agehiyên li ser dirêjbûn û çend dem girti bû jî digot. Ev yek ji çavên mirov baz ne dîda. Vê yekê, bala Mihemed jî kişandi bû. Lê Mihemed li ser wê yekê di wê heyamê de tiştek ne goti bû. Têne di serê xwe de dibir û dihanî. Mele Zeynedîn bi temen gelekî ji Mihemed mazin dihate xuyakirin. Di wê heyamê de divêt mirov bêjê ku Mele Zeynedîn û Meleye Ayserê Mele Tofîq jî jî hevdu nasdikirin û ji hev re weke hevalan bûn. Malê Tofîq yekî bi Melayê Cizîra re ma bû. Hez jê dikir. Lê bêhtir jî li ser Mele Husênê Bateyî bi evîn bû. Mele Husên Bateyî bi dîwan bû. Zembilfiroş û Mevlûda xwe re pir mazin dihate naskirin ji aliyê xelkê ve. Mihemed jî gelekî der heqê wî de seh kiri bû. Mele Husênê Bateyî ji Eşîra Errtûşîyan bû, ku li Colemergê dima. Ji ber vê yekê jî, Mihemed gelekî der heqê wî de ji seydayê xwe seh kiri bû.



Seydayê wî di biçûkatiya wî de, ew bi xwe re dibir Medresa Miksê yê Mir Husên û der heqê Mele Husênê Bateyî de wî li wir dida hesandin. Her weha Mihemed der heqê Mele Husênê Bateyî de jî xwediyê zanebûneke xurt bû. Gotinên Mele Husênê Bateyî, ku dihatine holê û Mele Tofîq hez dikir gelekî li ser wî bandûr dikir û dilxweş dibû. Mele Tofîq jî weke demekê di Medresa Mir Husên de mabû. Pişt re hati bû Cizîra Bota û êdî li wir bû. Li Cizîra Bota demeke dirêj li Medresê Sor dimêne. Pişt re tê Ayserê û li ser wê medresa li Ayserê, dimêne. Mirovekî gelekî kal bû. Ji ber vê yekê jî mirov gelekî rêz didanê. Mirov li gotinên wî baş dihensandin û hizra wî baş di serê xwe de digirtin. Mele Tofîq mirovekî zanista wî mazin bû. Mihemed ku hin bi hin, di nav axiftinan de diçû, fêhm dikir, ku mirovên li dora wî mirovên ku gelekî bi zanebûn bûn. Gava ku Mihemed li wan mirovê zane dimeyizand, didît ku li pêşiya wan hemûkan jî, nivîsen wan hebûn. Hemû nivîs jî, ew nivîsen ku wan nivîsî bûn.

Mihemed piştî ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe hew kir, êdî wî ji xwast tiştê bibêjê. Mele Zeynedîn di dawiya gotina xwe de Goti bû Mihemed: 'Tu jî hinekî der barê xwe û herêma xwe de bêjê da ku em jî li ser jiyana te bizani bin.' Mihemed jî, gava ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe hew kir, vêca wî dest bi gotinê kir: 'Ez bi xwe weke ku min di serî de gotî, ji Miksê me. Li wir min xwandina xwe kir. Lê li Medreseya Mir Husên Welî jî Hinekî mam. Pişt re weke demeke çûme nig Şêxê me li Îdirê. Seydayê min mirovekî gelekî xwedî zanist e û li Medresa Miksê dimêne. Seydayê min Bi koka xwe ji Zivingê ye. Piştî ku Mele Husên Bateyî gava ku digihê ber dilovaniya Xwedê û pê de, êdî seydayê min li cihê wî dimêne. Mele Husênê Bateyî her sal demeke diçû nig Mir Husên Welî. Wan hez ji

hevdu dikirin. Cara dawiyê zivistan e û gava ku divegere ji nig wî, di rê de ji befrê xwe dispêre şikeftekê. Lê ta ku befr kêm dibe û xelk xwe digihenênin ew digihê ber dilovaniya li wir. Zanista wî mazin bû. Mirov gelek tiştan jê fêr dibûn. Zimanê wî gelekî xweş û zelal bû. Gava ku nûçeya wî digihîjê mirov, gelekî dilê mirov diêşîne. Seydayê min nuha gelekî kal e. Ew bi xwe jî dinivisîne. Em bakinê: Mele Ehmedê Zivingî. Li ser babetan kûr e û pirtûken wî hene. Şêxê me jî gelekî hez jê dike. Em gelek caran bi hev re çûne nig şêx. Li wir min dît ku mirov gelekî li ser Melayê Cizîrî jî dipeyvîn. Li wir jî dihate naskirin. Lê min gelekî der barê wî de ji seydayê xwe seh kir.'

Mihemed bi wan gotinan re hê gelek peyivtinan li ser şêxê xwe û seydayê xwe jî dike. Ev herdu mirov gelekî bandûr li ser Mihemed kiri bûn. Gava ku Mihemed dipeyvî, ev yek ji gotinên wî dihate têgehîştin. Lê Melayê Cizîrî jî, gelekî gotinên wî li ser wî bûn. Navê Medresa Sor jî gelekî seh kiri bû, ku mirovên gelek zane li wir diman. Piştî ku Mele Zeynedîn peyvî bû, êdî Mihemed hê bêhtir li ser Melayê Cizîrî xwe gahandi bû hizreke zexm der barê wî de. Gava ku Mihemed ji herêma xwe û ji seydayê xwe û ji şêx dipeyvî, di mejiyê wî de Melayê Cizîrî dijiya. Gotinên Melayê Cizîrî yê ku weke beyt hati bûn holê, di serê wî de cih girti bûn. Gava ku Melayê Cizîrî gotinên wî yê ku weke beytan hati bûn ser zimên, êdî wî jî hinek gotinên xwe weke beytan hanî bûn ser zimên. Mihemed hinek gotinên Mele Husên Bateyî jî ji dîwana wî hanî bûn ser ziman. Ji xeynî vê yekê jî, hinek gotinên şêx û seydayê xwe jî hanî bûn ser zimên. Mihemed dengê wî jî xweş bû. Gava ku di nav axiftinan de germ dibû, êdî bi dengê xwe re jî hinekî dihanî ser zimên. Mirov jî gava ku lê dihesandin, gelekî bala wan diçû ser wî û gotinên wî yê ku dihanîne ser zimên. Gava ku Mihemed li ser Mele Husênê Bateyî

jî dipeyive, gelekî bala mirov dikişêne ser xwe di wê heyamê de. Mirovên herêmê, Mele Husênê Bateyî baş û qenc nas dikirin. Mele Husênê Bateyî, di dema feqetiya xwe de û pişt re, gava ku dibe Mele jî, têt herêma Botan û li wan deran digere. Ew bi xwe jî li Cizîra Bota ma bû. Bi wê yekê re jî li gelek derên din jî li herêmê geriya bû û dîti bû. Li nig Şêxê Serdefê jî ma bû. Li herêmê pir bêhtir dimîne û têt naskirin.

Mihemed li ser herêma ku jê hati bû û li ser saydayê xwe hizra xwe ji mirovên ku li dora wî rûniştî bûn re, hanî bû ser zimên. Mirov piştî ku Mihemed hizra xwe hanî bû ser zimên, dîti bûn ku mirovekî çawa bi zanebûn e. Êdî gelekî bala xwe didane wî. Mele Zeynedîn û Mele Tofîq piştî ku Mihemed dipeyivî û wan jî dîti bûn, ku bi axiftinê êdî pê re keti bûne guftugoyekê, ku kûr bû. Bi Mihemed re li ser gelek mijarên û kesayetiyên ku weke Mele Husênê Bateyî keti bûn guftûgoyê de. Bi çendî ku wan ji Mihemed dipirsî, Mihemed jî ji wan dipirsî. Mihemed gava ku keti bû pirjînê de, bêhtir jî, li ser Melayê Cizîrî pirsibû. Li ser demên Melayê Cizîrî yên ku berî ku here herêmên din, dipirsi. Mihemed gava ku dipirse bersiva pirsên xwe dihilde. Lê di serê Mihemed de, Medresa Sor û zanistvanên ku lê dijiyan ji wî re weke meraqeke mazin bû. Li ser vê xalê jî, ji wan dipirsi. Her weha di demeke dê guftûgoyên wan ewçend germ dibe, ku xwe ji bîr dikin. Di wê demê de jî, Mihemed carekê din hinek pirsên li ser hevdu dipirse. Vê yekê jî bala Mele Zeynedîn kişandi bû. Mele Zeynedîn gava ku bala wî dikisîne, ku Mihemed bi mereqa re ye û ji ser mereqiyên xwe re dipirse, êdî wî jî her weha li Mihemed zivirî û gotiyê: 'keke min, tu hinekî kelegerm xûya dikî. Ez ê tiştê ku karibim ji te re bêjim, ez ê bêjim. Lê tu hatî ku herî Cizîra Bota ku bixwe bibînî. Ez hinekî ji te re li ser Medresa Sor û jiyana seydayê

mazin Melayê Cizîrî bênim ser zimên û bibêjim. Medresa Sor gelekî mazin e ji aliyê zanebûnê ve. Gelek mirovên zane tê re hatine û çûne. Her yekê ku hatiye û çûne jî, bi zanebûna xwe re tiştê lê hiştiye û çûye. Her weha ez dikarim ji te re bi nimûnyek re bihênime ser zimên ku bêt têgehîştin. Her yekê ku hatî û çûye di wî baxçê re buhurtiye, kexşek çandiyê bi zanebûna xwe re. Ji gelek salan ve, ev yek hebûna xwe berdewam kiriye. Ê roj jî Melayê Cizîrî di wê baxça zanebûnê de kexşa diçêne. Ev ji tohv e. Ev tohv jî her weha kexş bi kexş bêhtir dibe. Ê roj li wir navê seydayê Cizîrî mazin e bi zanebûna wî re. Seydayê Cizîrî bi koka xwe ji Hasetê ye. Lê li Cizîra Bota mazin bû. Gava ku têt dema xwandinê, Mele Bateyî wî dib Cizîra Bota nig seydayê wî ye ku wê li nig wî bixwêne. Mele Bateyî ji malbateke bi hêz û mazin e. Bavê wî Hemed Beg jî mirovekî zane bû. Seydayê Cizîrî, pêşîkê li nig bavê xwe bingeha xwe digire. Pişt re diçe Cizîra Bota. Gava ku diçe Cizîra Bota jî, li Medresa Sor dimîne. Dema ku dimîne zanebûna xwe kûr dike. Bavê wî û berî bavê wî kalikê wî jî li Cizîra Bota xwendibûn li qesra Mîrê Mazin ma bûn. Ew bi xwe jî mirovê ku li gotinên wan dihate hesandin. Seydayê Cizîrî ji di dema feqetiya xwe de li nig Mirê Mazin dimîne. Mirê Mazin piştgiriya wî dike û gelek caran jî, wî dihilde nig xwe ji ber ku bi fehm û zanebûn e. Ez dikarim ji te re bêjim, ku Medresa Sor li piştta Mîrê Mazin Mîrê Bota bû. Mîrê Bota jî li piştta seydayê Cizîrî bû. Bi vê yekê re seydayê Cizîrî têt naskirin. Lê tiştê ku ew derdixê pêş jî, zanebûna wî ye ku şanî mirovan dide.'

Mihemed li van gotinên ji devê Mele Zeynedîn ve derdiketin pir bi bal û serinc li wan dihesand. Gelek tişt ji wan gotinên ji devê Mele Zeynedîn derdiketin, fêhm kiri bû. Piştî ku Mele Zeynedîn gotinên xwe hew kiri bûn, êdî di serê Mihemed de 'Medresa Sor',

Melayê Cizîrî', 'zanebûn', her mirovên ku hati bûn û buhurtibûn, kexşek ji zanebûna xwe tê de çandi bûn û buhurtibûn' û hwd.. Gelek ji van gotinên ku hati bûn ser zimên, di serê wî de cî bi cî bû bûn, diçûn û dihatin di wê heyamê de. Mihemed her weha piştî ku Mele Zeynedîn vebejîna xwe bi dawî kiri bû, êdî ew jî di cihê xwe de bêdeng ma bû di wê kêlîkê de û dihizirî di serê xwe de. Mihemed her weha di serê xwe de hê bêhtir bi hizir bû. Di wê heyamê de ji tiştên ku li serê wî kom bû bûn, zingînî di serê wî de vedidan. Bi wê zingîniye re di serê xwe de diçû û dihat. Lê divêt ku mirov bêjê ku Mihemed gelek tişt di serê xwe de girti bûn ji gotinên ku hati bûn ser zimên. Têgehîştin û şarezabûna wî, ew dikire xwediye hizrên mazin di rewşên weha de. Her weha di wê kêlîkê de hizra ku di serê Mihemed de çê bûyî ji xwesteka dîtina Melayê Cizîrî bû. Melayê Cizîrî wî çendî mazin û baş û qenc hati bû ser zimên, meraqa wî û xwesteka dîtine hê mazintir kiri bû. Lê gava ku ji hizra Melayê Cizîrî hati bû serê wî, di wê heyamê de Mihemed pir bi bal û serinc guhdar bû bû li yê ku dipeyivîn. Gava ku hizra Melayê Cizîrî hati bû ser zimên germbûna laşê Mihemed jî weke ku hê bêhtir bibe lê hati bû. Mihemed di wê heyamê de gava ku dihesand, di serê xwe de weke ku tiştê ku berê jiya bû û dîti bû li ber çavan wî diçû û dihat. Her weha bîranîn ew di hundurê xwe de biri bû û hanî bû. Hingê bi guftûgoyan re weke ku di serê xwe de xwe gihandi be Melayê Cizîrî lê hati bû. Hizra wî bêhtir fêr bû bû di guftûgoyan de. Lê di serê xwe de gava ku dihizirî, ji xwe re got ku 'divêt ku ez xwe bigihênime Melayê Cizîrî'. Hizrek di serê wî de çê dibû û di mejiyê wî de weke xwurandinek mazin bi wî hizrê re bigre, lê dihat. Her welê, xwastina wî yê, ku dixwast ku Melayê Cizîrî bibîne xwe mazin bi wî re dida derve.

Mihemed her weha gelek guftûgoyên ku di serê wî de hizir çêkiri bûn, kiri bû. Bi wan guftûgoyan re naskirina pê re baş û mazin çê bû bû. Di guftûgoyan de bêhtir jî di serê xwe de xwe gihandi bû hizrên wan mirovan, ku tenê navên wan seh kiri bû. Her weha weke Melayê Cizîrî. Piştî guftûgoyan, Mihemed bi keşe Tuma re wê şevê li mala Rame Beg biman. Lê Mihemed di wan guftûgoyên, ku kiri bû de, xwastibû riya xwe hinekî din jî bizivîrîne. Xwastina çûna Hasatê pê re çê bû bû. Gava ku li hevdu rûniştî bûn, di rûniştinê de mirovê ku weke wî biyanî bûn hineken din jî hebûn. Her weha weke Mele Şefîq. Mele Şefîq mirovekî ku ji aliyê herêma Hezexe wan dera bû. Ew bi xwe ji herêma ku digotinê Sincaqê bû. Sincaqê hinekî dûr bû ji wir. Mele Şefîq hati bû ku here Cizîra Bota. Hê yekî ciwan jî bû. Lê bûbû Mele. Mele Şefîq perwerdeya xwe li Cizîra Bota dihilde. Pişt re ku dibe Mele, êdî divêt vegere malê. Piştî meletiyê jî xwandin dihate berdewamkirin. Mele Şefîq berî ku çûba Cizîra Bota wê riya xwe bi aliyê Hasatê ve jî xistiba. Di dema axiftinan de bêhtir ne axifî bû. Têne hema wilo di cihê xwe de ma bû û li guftûgoyan dihesand. Yekî jîr dihate xuyakirin. Kêm tevî guftûgoyan dibû. Gava ku gotinên xwe digotin jî, mirov lê dihesandin. Ew bi xwe jî nêzîkê Mele Tofîq rûniştî bû. Lê gelek caran jî Mihemed bi çavên xwe re ew biri bû. Lê ewne ji bo axiftina li hevberê hevdu bûn. Gava ku guftûgo di navbera Mihemed û Mele Zeynedîn de hinekî kêm dibin, êdî Mihemed jî hinekî bi wî re mijûl dibe û dipeyive. Bi axiftinê re ji hevdu nas dikin. Mele Şefîq ji Mihemed re dibêjê ku wê here nig Melayê Cizîrî. Mihemed gava ku vê yekê dibihîze, êdî ew jî dibejiyê: 'em bi hev re ta wê derê riya xwe bikine yek û herin te got çî?' Mele Şefîq vê yekê erê dike. Mihemed bêhtir wan herêman nas ne dikir. Ji ber vê yekê jî bêhtir tiştê ne Goti bû. Gava ku dem ber bi rezanê

ve têt jî her weha biryara xwe didin û diçin ku razên. Keşe Tuma jî wê bi Mihemed re riya xwe berdewam kiri ba. Her weha gava ku Mihemed û Mele Şefîq gotina xwe kirin, êdî diçin û dirazên. Lê gava ku Mihemed diçe ser cihê xwe ku rezê, xew bi çavan wî na keve ji ber ku di guftûgoyan de tiştên ku bihîsti bû, li bîra wî bûn û ew gelekî mijûl dikirin. Mihemed bi gelek saydayan re rûnişti bû û guftûgo kiri bû. Di nav wan de weke seydayekî hati bû dîtin û naskirin.

Êdî Mihemed weke ku di jiyana xwe de di demeke nû de be, lê dihat. Mirov ku ew di nav wan de rûnişti bû, ew weke seydayekî herê kiri bûn. Zanebûna wî di wê heyamê de xwe dabû derve. Di nav wan mirovan de dîti bûn, ku zanebûna wî ji ne kêmi wan mirovên ku gelekî zane bûn. Vê yekê weke hizra wî di serê wî de dida nîşandan. Mihemed jî gava ku li ser vê yekê dihizirî, gelekî di hundurê xwe de dilperîn dibû. Her weha jî gava ku dihizirî, xewa wî ji ser çavan wî direvî. Mejiyê wî ew bi van xalan re di hundurê xwe de dibir û dihanî. Ew jî bi hizrên ku di serê wî de çê dibûn, ji xwe diçû. Her weha Mihemed di nav cihê xwe de jî dema xwe ya razanê tev bi hizirkirinan re dibuhurîne. Di serê wî de piştî ku wan guftûgoyên ku bi wan mirovên zane re kiri bû û pê de gelek hizrên mazin çê dibûn. Di guftûgoyan de weke meleyekî guftûgo kiri bû. Li hevberê çî pirs û gotinan xitimandin pê re çê ne dibû. Bersiva her pirsê ku jê hati bû pirsîn dabû. Bi her gotina ku hati bû ser zimên re hizra xwe hanî bû ser zimên. Dîtin û nêrînên xwe bi mirovên li dora xwe re hevpar kiri bû. Mirov jî her weha gava ku wî hizra xwe hanî bû ser zimên, li wî weke seydayekî bihîsti bûn. Ew bi xwe jî êdî seydayek bû. Ew bi xwe mirovekî ku zane bû û her weha bi mirovên zane re rûnişti bû. Ew êdî di nav mirovan de weke zanistvanekî

dihate naskirin. Ji aliyê din ve jî mirovên ku di wê heyamê de lê hesandi bûn, êdî ew weke ku mirovekî zane be, nas kiri bûn û herê kiri bûn. Ew ji aliyê wan mirov ve bi vî awayî hati bû herêkirin û naskirin. Ev naskirin jî her weha dibû bingeha naskirina wî ya herêmê ya ku wê her dem were bi bîrhanîn.

Gava ku çûbû ser cihê xwe weke heyameke dirêj şiyar û di hiziran de ma bû. Piştî ku hinekî di nav cihê xwe de şiyar dimêne, êdî dike ku rezê ta ber beyaniya serê sibehê. Hinekî dirazê ji ber ku pir wastahî bû. Rê hinekî ew westandi bû. Gava ku şiyar ma bû jî her weha aliyekî wî ne dihêst ku bikeve xewê de û rezê, her çend aliyekî wî yê din jî fikir ku bikeve xewê û rezê. Lê ta ku hinekî di nav cihên xwe de dihizire, êdî pişt re dike ku rezahê û dirazê. Gava ku dikeve nav hizran, bi hizirandina xwe re, hêdî hêdî xew xwe diberde ser çavan wî û ew ji xwe diçe. Di serî de hinekî li ber xwe jî dabû. Lê westandina ku keti bû di laşê wî de, ew bêqerem kiri bû. Gava ku bêqerem dimêne, êdî dikeve xew de. Her weha ta berê sibehê direzê. Bi berê sibehê ve, serê beyanî ji xwe dirabe û xwe amade dike. Gava ku dirabe ser xwe û dimeyizêne ku hê çi kesek ji xewê ne rabûye ser xwe di wê kêlîkê de, êdî ew ji oda xwe na derkeve, ta ku wanê din dirabin. Têne hinek xatênên ku rabû bûn ser xwe û bi kar û barên xwe ve diçûn. Mihemed jî her weha dimeyizêne, ku hê bêhtir çi kesek ne rabûye ji xewê êdî ew jî ta hinek mirovên din rabin li odeya xwe dimîne. Gava ku li odeya xwe dimênê jî her weha amadekirî dimênê. Di odeya xwe de li ser cihê xwe dirûne û li hinek nivîs û pirtukên yên ku her dem bi xwe re digerlandin, dimeyizêne. Ta ku mirov din ji dirabin ser xwe, ew jî bi vî awayî di odeya xwe de dimênê. Lê ew der mala beg bû û çavên mirovan li ser bû ji ber vê yekê jî hezûkenê ji xewê rabûn çê dibû.



Weke heyamekê dimîne pişt re êdî mirovên din dirabine ser xwe de. Gava ku Mihemed wan mirovên ku rabûne ser xwe dibine êdî ew ji dike ku rabe û here nig wan. Mihemed gava ku dike ku here derve ji odeya xwe, di wê heyamê de di devê derî de rastî Mele Zeynedîn têt. Gava ku Mele Zeynedîn wî dibine û ew jî wî dibine, êdî ber bi hevdu ve diçin. Mihemed û Mele Zeynedîn digîjine hevdu û ji hev re dibêjin beyanî baş. Gava ku Mele Zeynedîn têt nig wî, êdî bi hev re didine rex hevdu û diçine derv, ku hinekî bêhna xwe bistênin. Gava ku diçine derve, di wê heyamê de rastî hinek mirovên din, yên ku wê şevê li mala beg ma bûn dihên. Ji hev re beyanî baş dibêjin û bi hev re di bin hênikayiya sibehê de ji xwe re digerin. Gava dema taştê têt, êdî ew jî bi hev re didine rex hevdu û diçine ber bi odaya ku lê taştê bikin. Gava ku têne ber odeyê, hê ne ketine odê de li ber devê odê rastî Rame Beg jî dihên. Gava ku rastî hevdu dihên, êdî ji hev re dibêjin beyanî baş û bi hev re didine rex hevdu û dikevîne odayê ku wê tê de taştê bikin bi hev re. Gava ku têne odeyê dimeyîzênin ku wa taştê hatî amadekirin jî ji wan re ku bixwun. Mirovên ku di nav mala Rame Beg de sûxra malê dikirin, gelek bûn. Ew mirovên ku sûxrevanê malê bûn, ji zû dirabûn û karê ku wê kiri bana dikirin. Mirovên ku di mala beg de sûxra mala beg dikirin, gelek ji wan piştî ku karê xwe dikirin, diçûne malên xwe. Lê mirovên ku sûxrvan, dikirin li wan tenê weke sûxreker ne dihate meyizandin. Her weha weke ku ji mala beg bin, dihatine dîtin. Wan mirovan gava ku begê wan çû ba şerekê yan ji her weha derekî ew jî pê re diçûn. Mirovên bi begê xwe ve girêdayî bûn. Bi vî awayî gelek mirovên ku ji bo begê xwe ruhê xwe jî daban, hebûn. Hemû jî li nig wî diman. Gava ku li malê beg dihate meyizandin, weke ku malekî ku gelekî mazin be dihate xuyakirin û dîtin. Mirov ku li nig beg

maba, rêzê wan hebû. Bi vê yekê re gava ku li wan mirovan jî dihate meyizandin. Weke ku li mazinatiya beg were meyizandin dihate xuyakirin û dîtin. Beg bi wan mazin bû. Ew jî bi beg re mazin bûn. Bi vî awayî di nav civakê de hevdu tamam dikirin. Mirovên ku li mala beg maba jî ji aliyê wan mirovên ve sûxrevaniya wan dihate kirin. Bi vê yekê re mazinatiya mala beg dihate nîşandan ji wan mirovên ku hati bûne mêhvandariyê. Di vir de her weha hinek gotinên ku ji aliyê mirovan ve hati bûn kirin hebûn ji bo vê rewşê. Bi vê yekê re ji mala beg re dihate gotin ku mala 'malmazin.' Malmazin ne tenê bi wateyekê dihate ser zimên. Her weha gelek wateyên wê hebûn û bi wan wateyên re dihate ser zimên. Wate pêşîkê ew bû ku ji mala beg re dihate gotin, ku ew mal mala mazinan e. Wateya duyemîn jî mala ku gelek mirov têde kar dikirin bû û rêz û karê wê mazin bû. Wateya sêyemîn jî ji aliyê alîkariyê ve û ji aliyê ve dihate şirovekirin. Wateya çaremîn jî her weha wateya ku ew mal mala serekeyekî bû û bi vê yekê re jî çî carekê ji wê malê mêhvan û hatin û çûyin qut ne dibûn. Mala beg her weha malmazin bû.

Beg û mirovên ku pê re ne û Mihemed jî bi wan re gava ku taştîya xwe dikin, pişt re derbasê odeya rûniştine dibin. Li wir jî weke heyamekê bi hev re dirûnin. Hêdî hêdî yên ku wê bi rê ve çûban, karê xwe dikirin. Mele Şefîq jî her weha karê xwe dikir. Mihemed jî xwe hê ji sibehê ve amade kiri bû. Mele Şefîq û Mihemed xwe karkirin ku rabine ser xwe ku wê herin. Keşe Tuma jî dest bi karkirina xwe kir ku bi wan re rabe. Ew jî wê bi wan re çûba. Rame Beg bi rêze mala xwe re bi wan dipeyivî û gote wan: 'Min diviya bû ku hûn hinekî din jî li malê bimînin.' Yên ku wê çûban supasiya xwe êdî şanî wî dan û gotinê: 'Em ji xweymaliya Te û ji Te xweşnûd ji vir diveveqetin. Divêt ku em bi rekevin da ku şev di rê de

ne mînin'. Piştî van gotinên mêhvanan, êdî Rame Beg ji çend sûxrekaran re dibêje ku hinek rêveng, xurakê rê amede bikin û bixine tûrikên wan de da ku di rê de ku gava birçi bûn bixwarana. Dema bi rêketinê têt û Mele Şefîq, Mihemed û keşe Tuma didine rex hevdu û xatirê ji malê dixwazin û ku herin. Gava ku ew dirabine ser xwe ku herin êdî Rame Beg ji bi wan re dirabe ser xwe û bi wan re têt devê derî ku wan bi rê ke. Gava ku ew dikevîne rê de, Rame Beg jî careke din divegere nav civatê.

Mihemed, Mele Şefîq û keşe Tuma gava ku ji mala beg dikevîne ser rê de hinekî lingên xwe jî sivîk dîkin da ku hinekî zû xwe bigehînine Hesatê. Hesatê weke heyamekê ji wir dûr bû û wê daban çola û çûban wir. Di rê de gava ku diçûn, hem ji xwe re dipeyivîn û hem jî bi lezekê re diçûn. Mele Şefîq yekî xort bû. Ji ber vê yekê jî mirovekî ku lingê wî sivîk bû. Mihemed jî mirov xort bû. Keşe Tuma jî mirovekî li ser xwe bû, keti bûne rex hevdu de di rê de.

Gava ji navenda Ayserê derdikevin û dikevîne nav erdan de, êdî rastî mirovên ku dixebitîn dihatin. Hinek mirovên ku erdên xwe çandi bûn, hinekî jî keviya erdên xwe ji bayar hêştî bûn ji ber ku hinek çandinên din bikin. Gava ku rastî mirovan dihatin, didîtin ku wan mirovan di wan erdên xwe yên beyar de çot dîkin. Piranî gamêşên xwe bi gîsnên xwe ve girê dabûn û çot dîkin. Mihemed û hevalên xwe gava ku li wan mirovên cotkar û li cihê gîsnên wan dimeyizandin, ne dixwastin, ku çavên xwe ji wan mirovan û erdê qut bikin. Çavên wan diçû ser cihê ku gîsin lê keti bû. Cihê ku gîsin lê keti bû jî sorekî tarî dida ber çavan. Ax sor bû. Gava ku gîsin jî lê diket, axake sor dirakir. Li ber keviyên erdên mirov, ku dirawestiyên. Piranî jin bûn dihatine xuyakirin. Hinek ji wan ji bi zarokên xwe re li keviya erdên bûn. Gava ku Mihemed, Mele Şefîq

û keşe Tuma digihîjine dahma wan silav didane wan û paşê dibuhurtin. Lê her sêkan jî gava ku li ruyê wan dihate meyizandin, dihate dîtin ku bi dilxweş bûn. Ji xwe re dipeyvîn û di riya xwe de diçûn. Car bi car di rê de hingê axiftinan dikirin ni zanibûn ka riya wan çawa dibuhurt. Mihemed, hem bi Mele Şefîq re û keşe Tuma re didipeyivî û hem jî di hundurê xwe de li ser dawiya riya xwe ku wê rastî Melayê Cizîrî hati ba, dihizirî. Mihemed ji bo vê yekê pir dilşad bû. Pê re hinekî dilperîn hebû. Wî ji seydayê xwe û gava ku çû bû nig mala şêx gelekî li ser Melayê Cizîrî vebêjîn bihîsti bûn. Wê kêlîkê jî di rê de bû û diçû nig wî mirove ku der barê wî de ev çend tişt bihîsti bû. Car bi car ji gava ku bi Mele Şefîq re dipeyivî gotin dihani ser Mele Cizîrî ku baştir bizane ka mirovekî çawa ye. Mele Şefîq jî çî zani bû û bihîsti bû û tiştê ku di wê heyamê de di hişê wî de bû, ji Mihemed re peyv bi peyv digot. Lê çî bersiva ku Mihemed hildaba jî di serê wî de ne dibû bersivek ku têra wî dikir. Her bersiva ku wî dihilda jî weke ku di serê wî de dibû sedama pîrsekê. Bersiv û pîrs û pîrs û bersiv di serê wî de hevdu dibir û dihanî. Lê di wê kêlîkê de, di serê wî de yek ji yekê re têr ne dikir.

Demeke dirêj diçin êdî digihîjine nêzîkê herêma ku Hesatê lê bû. Çend ku ber ve diçûn dilperîna dilê Mihemed hê bêhtir dibû. Çend ku dilperiya wî bêhtir dibû jî, hê bêhtir laşê wî weke ku germ dibû lê dihat. Di rastiye de ji Mihemed gelekî meraqan dikir, ku Mele mirovekî çawa bû. Mihemed gelek gotin der barê wî de bihîsti bûn. Nuha di rê de bû û wê çûba nig û wê ew bi çavên xwe dîti ba. Gava ku wî ev yekê di serê xwe de dibir û dihanî, dilperiyek bi gelek pîrsan re dikete di dil û serê wî de. Mihemed di serê xwe de gelekî dihizirî. Hizirandina wî bi bêhtirî jî li ser çûna nig Melayê Cizîrî bû. Gava ku keti bûne rê de di serê de gelekî guftûgo dikirin û ji xwe re

dipeyivî. Lê ku hinekî din rê çûbûn, êdî guftûgoyên di navbera wan de kêmbûn, ji ber ku hinekî westandina xwe bi wan re dabû der. Lê ku giha bûn nêzîkê herêma Hesatê, êdî weke ku carekê dî werine xwe li wan hati bû.

Mele Şefîq, Mihemed û Keşe Tuma her weha weke heyamekê diherin, digehîjin herêmê û êdî navenda Hesatê didîtin. Gava ku navendê dibinin, êdî Mele Şefîq li Mihemed dizîvire û dibêje: 'Weha Hesat e, em gihanê.' Gava Mihemed vê yekê dibihîze, bi gotina Mele Şefîq re bi aliyê Hesate ve dimeyîzîne. Dibîne ku cihekî ku ne bêhtir biçûk dihate xuyakirin. Lê ne bêhtir jî mazin bû. Her weha herêmeke ku bi aliyê wê yê çepê ve çiyayek dihate xuyakirin. Çiyayê ku dihate xuyakirin jî, ne bêhtir bilind bû. Li ber çiyê jî gelek darên ku nêzîki hevdu bûn, dihatine xuyakirin. Bi aliyên din ve jî gava ku dihate meyizandin, dihatê dîtin ku hinek kaşên din yên ku li pey hev bûn hebûn. Her weha bi dîtina kaşan re dirêjbûnek çêdi bû. Mele Şefîq gava ku navend têt dîtin, êdî li Mihemed dimeyîzîne. Mihemed gava ku ew dimeyîzîne, dibêjiyê de ku li çî dimeyîzênî. Mele Şefîq gava ku Mihemed jê dipirse, ew jî bi aliyê çiyê ve dimeyîzîne û bersiva Mihemed dide: 'Tu wan darên ha dibînî? Em hinekî ber bi wan daran ve herin. Em ji wê aliyê ve bikevine gund. Li wir newalekî gelekî xweş têt, em ê wê jî bibînin. Di wê newalê de kahniyêke ku ava wê gelekî xweş e heye. Dibêjine; Kahniyaberê. Kahniyaberê ava wê kûr ji binê erdê ve derdikeve û pir xweş e. Li dora wê jî gava ku mirov dirûnê, hênikayiyekê ku gelekî xweş e bi mirov digire. Em di wir ve herin û wê derê jî bibînin, ma hûn çî dibêjin?' Her weha gava ku Mele Şefîq vê yekê ji Mihemed û Keşe Tuma re dibêjê, êdî ew jî herê kirin û bi hev re berê xwe dan bi wir ve û çûn ber bi newalê ve. Piştî ku hinekî diherin, êdî digihine

newalê û diçine serê Kahniyaberê. Li wir weke heyamekê dimînin û bêhne xwe distênin, êdî pê de careke din xwe didine hevdu û dikevîne riya xwe de ku herine navenda Hesate. Piştî ku ji ser Kahniyaberê weke heyameke diherin, êdî pê de digehîjine navenda Hesate. Gava ku digehîjine navendê êdî rast û rast berê didine cihê ku Melayê Cizîrî wê wê be. Mihemed hinekî bi dilperîn bû di hundurê xwe de. Gava ku di nav malan de diçûn jî, wî gelekî wî li dora xwe dimeyizand. Çavên xwe li dora xwe digeland. Mele Şefîq berî vê carê ku hati bû nig Melayê Cizîrî, careke din ji hati bû ji ber vê yekê ji zanibû ku wê Melayê Cizîrî li ku derê dimîne. Melayê Cizîrî piranî li Medresa Sor ku li nav Cizîra Bota bû dima. Lê hinek demên xwe her weha li Hesatê jî dibuhurand. Mele Şefîq vê yekê dizani bû. Mele Şefîq dizani bû ku di wê heyamê de Melayê Cizîrî wê li wir be. Li Hesatê di rex mizgeftê cihekî ku weke cihê xwandinê bi kar dihate hanîn, hebû. Ew der jî weke medresa wê derê bi kar dihate hanîn. Melayê Cizîrî piraniya caran jî li wir dima. Her sibeh zarokên gund li hevdu dihatin û li wir perwerde didîtin. Meleyê Hesate jî hebû. Ew jî navê wî Mele Yûsif bû. Ew bi perwerdeya zarokan re mijûl dibû. Her sibeh ku zarok dihatine ji bo xwandinê, bi wan ve ew mijûl dibû. Car bi car Melayê Cizîrî ji mijûl dibû. Lê Melayê Cizîrî bi pêdeçûnê ve mijûl dibû. Mele Şefîq gava ku hati bû navenda Hasatê, êdî li Mihemed zivirî bû û gotibûyê: 'Divêt em herine mizgeftê.' Mihemed jî Goti bûyê 'belê.' Êdî wan ji berê xwe dabûn ber bi mizgeftê ve.

Gava ku di rê de diçin, rastî hinek kesan dihên ku wê ew jî biçûna mizgeftê. Gava dihên dahma hevdu, slavê didine hev û li dahma dirawestin. Yek ji wan mirovan dest bi pirsînê dike ji Mihemed û hevalên wî. Gava ku pirsên xwe dipirse, Mele Şefîq

bersiva wan dide. Piştî ku pirs hati bû pirsin û Mele Şefîq jî bersiv dabû, êdî pê de ne Mihemed û ne jî Keşe Tuma deng ne kiri bû. Ew mafê axiftinê ji Mele Şefîq re hişti bûn. Yê ku pirs pirsî bûn ji wan, pirsî bûn ku ew ji ku derê hatine û wê bi ku derê ve herin?. Mele Şefîq gava ku dibêjê wan ku ew hatine ku Melayê Cizîrî bibînin êdî ew didine rex hevdu û diçin ku herine nig Melayê Cizîrî. Ne Mihemed, ne Mele Şefîq û ne jî Keşe Tuma xelkê wê derê bûn. Ji ber vê yekê jî baş dihate têgehîştin ji wan û nêzîkatiyên wan. Mirovên wê derê hema bêjê hemû hevdu nas dikirin. Lê ew hersê ne dihatine naskirin. Gava rastî wan mirovên ji xelkê wê derê hati bûn, ji zûka li hevdu germ bû bûn. Gava ku didine rex hevdu, êdî rast û rast diçine ber bi mizgeftê ve, ku herine nig Melayê Cizîrî. Dem ji nîvro buhurti bû. Lê bi ber mizgeftê ve diçûn. Bi vê yekê re Mele Şefîq dipeyivî û ji wan dipirsî: 'Ma gelo seyda nuha hê li mizgeftê ye?' Yekî ku ji wan mirovên rêberê wan, hinekî jî navsere dihate xuya dikir, bersiva Mele Şefîq da û jê re got: 'Herê, Mele gava ku te mizgeftê ku mêhvanên wî hebin, wan jî bi xwe re dihêne mizgeftê. Bi hev re dihên û Mele hinekî bi mêvanan re dipeyive û pişt re civîn belav dibe. Nuha hê civîn belav ne bûye. Mele hê li wir e. Em ê herin ku hê axiftina wî hew ne bûye. Em ê hinekî lê guhdar bin. Piştî ku Mele axiftina xwe hew kir êdî wê civîn jî belav be.' Piştî van gotinan êdî hinekî bêdengi çê bû. Lê bêdengî bêhtir berdewam ne kir. Pişt re yekî ji xelkê wir digot: 'Mele bêhtir li vir na mîne. Bêhtir li Cizîra Bota dimîne û li Medresa Sor e. Ne zû ve hatiye vir. Berî nuha bi çendakê hat vir. Lê wê dîsan vegere here Cizîra Bota. Li wir bi cih e û şagirdên ku li wir jê fêrê digirin hene. Bi aliyê Memolanê wan deran ve çû bû. Gava ku divêt vegere jî, riya xwe bi vir dixê. Gava ku hat vir jî gelek mirovên ku wî bibînin jî hatine vir.

Ji ber vê yekê ji li vir ma. Mala meleye min ji ji vir bêhtir nedûre. Gava ku Mele têt vir, êdî ev der jî dibe bi nav û deng. Mele, li cihê ku xelk bêhtir hebe li wir dimîne. Ji ber ku mirovên ku werin wî bibînin, da ku ew jî derfet çêke ku wan bibîne. Nuha li gûnd gelek mirovên ku ji derên dûr hatine hene. Hemû jî hatine ku Melê bibînin. Jin, mêr û zarokbi hev re hatine ku wî bibînin.'

Her weha ji xwe re dipeyvîn di rê de ta ku digihîjine mizgeftê. Gava ku digehîjine mizgeftê êdî dimeyizênin, ku wa ye li wir gelek mirovên ku li hev kom bûne hebûn û Mele di nav wan de dipeyive. Lê gava ku dibînen pêşîkê komê mirovan dibînen. Melayê Cizîrî bêhtir ji aliyê Mihemed wan ve na yêt dîtin. Ji ber ku di navbera wan de gelek mirov hene. Mirov gava ku nivêj kiri bûn, êdî bi hev re derketi bûn derve û ji xwe re rûnişti bûn û li Melê dihesandin. Gava ku ew jî bi hev re digihîjine nig komê, pêşîkê hinekî weke ku se çer gavan ji komê dûr dimînin. Ji xwe bixwastina jî, ni kari bûn ku bêhtir ber bi pêş ve herin, ji ber ku gelek mirov kom bû bûn. Gava ku Melayê Cizîrî di nav gotina xwe de hinekî dirawestiya, êdî ew jî bi yekcarî diçine nav wan mirovan û slavê didine wan û di nav wan de dirûnin. Her weha gava ku dirûnin weke heyamekê bêdeng dirûnin û li Melayê Cizîrî dihesin.

Melayê Cizîrî gava ku li aliyê wî dihate meyizandi, dihate dîtin ku wa ye hinek pirtûkên li nig wî hebûn. Divana wî ya bi nav û deng jî li pêşiya wî bû. Li hinekî bi aliyê wî ye rastê ve, li dahma kaboka wî bû. Hinek nivîsen wî yên din jî li nig wî bûn. Car bi car jî gava ku dipeyvî û di nav axiftina xwe de dipa, jî li wan nivîsên xwe dimeyizand. Melayê Cizîrî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtin ku girêdana wî giredana cizîriyan bû. Hinekî heniya wî vekirî bû. Birûhên wî ne bêhtir stûr bûn û ne jî bêhtir zirav.. Lê hinekî ji



hevbelakîrî dihatine xuyakirin. Rûdana wî gêş bû, lê hinekî jî jidil di hate xuyakirin. Mirovekî ku ne bêhtir hûr bû. Hinekî gir bû û dirêj jî bû. Gava ku dipeyvî, dengê wî h3ıkarî û bandûr li mirov dikir. Dengê wî li ser wî bû, ku gava li wî dengî di hate hesandin, rahranok di laşê mirov de dihanîn. Mihemed jî gava ku rûnişti bû, her weha hema wî di cihê xwe de rûnişti bû û li wî dimeyizand û dihesand. Mihemed gava ku rûnişti bû Mele Şefîq jî li nig wî rûniştî bû. Keşe Tuma jî hinekî jê wir de rûnişti bû. Mirov fahm dikir ku Keşe Tuma mirovekî ku ji aliyê olîtiyê ve yekî ku cuda bû. Her weha her kesek di cihê xwe de rûnişti bû û li Melayê Cizîrî dihesandin. Piştî heyamekê Mihemed û Melayê Cizîrî çav bi çav dihên. Gava ku çav bi çav dihên, êdî Melayê Cizîrî dibîne ku wa ye çavên Mihemed rasterast li ser wî ye. Bala wî jî bi vê yekê re diçe ser Mihemed. Gava ku bala Melayê Cizîrî diçe ser Mihemed, êdî car bi car çavên xwe dihanîne ser wî û lê dimeyizand. Mihemed li cihê xwe req li Melayê Cizîrî dimeyizand û dihesand. Ta ku Melayê Cizîrî axiftina xwe hew kir ev yek bi Mihemed re her berdewam kir. Mihemed gelek dilper di hate xuyakirin. Gava ku Mihemed li Melayê Cizîrî dimeyizand û lê dihesand, gelekî dilxweşiyekî mazin xwe di rûdana wî de dida derve. Ta Melayê Cizîrî dipeyvî, ew di cihê xwe de wisan bêliv ma bû. Piştî ku Melayê Cizîrî axiftina xwe hew kiri bû êdî pê de, bala xwe dabû ser Mihemed. Mihemed mirovekî ku bi nêzîkatiyên xwe re xwe diyar dikir.

Melayê Cizîrî yekî pîr bû. Lê Mihemed di wê demê de hê ji nûka, ji dema ciwaniya xwe derdiketi bû. Mihemed bi nêzîkatiyên xwe re weke mirovekî, ku gelekî têgehîştî diyar dibû. Vê yekê jî bala Melayê Cizîrî kişandi bû. Gava ku Melayê Cizîrî ew dîti bû, hê di nivê axiftina xwe de bû û bala wî çû bû ser wî di wê heyamê de. Melayê Cizîrî

gava ku di nav axiftina wî de bala wî çûbû ser Mihemedî, êdî bi hinek awiran ve çavên xwe dibire ser wî û li wî dimeyizand. Lê gava ku axiftina xwe hew kiri bû êdî pê de, carekê din slav dabû Mihemed û pê re dest bi axiftinê kiri bû. Melayê Cizîrî gava ku bala xwe dide ser Mihemed, êdî bala mirovên ku li dora wî bûn jî diçe ser Mihemed. Gava ku Melayê Cizîrî slavê careke din didiyê, bi slavê xwe re dibêjiyê 'hinekî bi pêş ve were û bi xêr were!' Mihemed jî gava ku Melayê Cizîrî her weha dibêjiyê, êdî ew jî hinekî xwe bi pêş ve dide. Piştî ku Mihemed hinekî bi pêş ve diçe, êdî Melayê Cizîrî hinek pirsan jê dike da ku wî nas bike. Mihemed gava ku Melayê Cizîrî pirsan jê dike, ew jî der barê xwe de jê re dipeyive. Piştî ku Mihemed dipeyive, mirovên dora wî jî bi gotinên wî re ew nas kiri bûn. Mihemed di wê heyamê de bala Melayê Cizîrî û yên li dora mazin kişandi bû ser xwe û gotinên xwe. Mihemed piştî ku hinek behsa xwe dike û hinek bi Melayê Cizîrî re jî got û bêjê dike, pişt re hinekî naveng bêdeng dibe. Gava ku Mihemed dipeyivî, axiftina wî li ser mirovê ku li wir rûnişti bûn û li wî hesandi bûn bandûrek hêşti bû. Êdî bala mirovên li dora wî bi vê yekê re çûbû ser wî. Di wê heyamê de bala Melayê Cizîrî jî pirtir çûbû ser wî. Piştî ku Melayê Cizîrî li wî her weha hesandi bû, êdî pê de ne hêşti bû ku ew ji nig wî qut bibe. Mihemed xwediyê dengêkî zelal bû. Ji ber vê yekê jî di serê mirovên, ku li wî hesandi bûn, bandûreke mazin hêşti bû.

Her weha piştî hatina Mihemed û hevalên wî yê li nav civatê, êdî civat dike ku ji hev bela bibe. Hêdî hêdî mirov hewl didan, ku rabin û herin. Lê li ciyê xwe diman, ta ku Melayê Cizîrî rabûba ser xwe. Bi Melayê Cizîrî re wê rabûbana ser xwe û çûbûbana. Melayê Cizîrî jî dikir ku rabe di wê heyamê de. Heyamek paşê êdî Melayê Cizîrî welê dibêjê ji yên ku li dora wî ne: 'Em rabine ser xwe û herine

malên xwe, hinekî li malê bi mêhvanên xwe re jî em rûnên.’ Piştî ve gotinê, Melayê Cizîrî ji Mihemed û Mele Şefîq û Keşe Tuma re dibêjê: ‘Fermon! Dixwazim ku hûn bi min re werine malê. Em nuha bi hev re rabin û herine malê.’ Mihemed bi guhên xwe bawer ne dibû ji dilxweşiya xwe.

Pişt re bi hev re dirabin û didine rex hevdu û diçin ku herine mala Melayê Cizîrî. Gava ku dirabin û dikevîne rê, Mihemed û Melayê Cizîrî didine rex hevdu. Gava ku ji hewşa mizgeftê derdikevîn û dikevîne rê, di re de Mihemed çavên xwe li dora xwe digerîne û li mirovên li dora xwe dimeyizêne. Li malan jî dimeyizêne. Hesat herêmeke ku gelekî xweş dihate xuyakirin. Mirovên ku li dûrên wan jî bûn, zane bûn. Gava ku diçin di rê de rastî zarokên ku bi hev re dileyistin dihên. Zarok ji xwe re bi kaşokan re dileyistin. Dengên wan gelekî bilind dihate mirov gava ku dileyistin. Gelek ji wan zarokên ji kaşok di destên wan de hebûn. Zarok ji xwe re kelik çê dikirin û bi kaşokan re nîşan lê digirtin. Mihemed gava ku digihê dehma wan zarokan, li wan dimeyizêne û dibuhure ji wan bi Melayê Cizîrî û yê ku bi wan re bûn. Gava ku yê ku bi Melayê Cizîrî re hati bûn, ku ji zarokan dibuhurîn, êdî pê de weke heyamekê ku pişt re diherin û digihine malê Melayê Cizîrî. Gava ku digihine malê, êdî bi hev re dikevîne hewşa malê de û dibuhurine oda rûniştinê û ji xwe re dirûnin û dest bi axiftina dikin dîsan.

Mihemed gava ku bi Melayê Cizîrî re hati bû di rê de gelekî li dora xwe meyizandi bû. Gava ku meyizandi bû jî xwasti bû ku wan deran nas bike û mirovên wê derê bibîne. Mala Melayê Cizîrî jî ji mizgeftê bêhtir ne dûr bû. Ji ber vê yekê jî bêhtir di nav malan de ne çû bûn. Tenê di tara ku di navbera mizgeftê û malan de bû buhurti bûn. Gava ku hati bûne malê jî çûbûn odeya civatê û ji xwe

re rûnişti bûn û bi hev re dest bi axiftina kiri bûn. Mala Melayê Cizîrî hinekî mazin bû. Çûn û hatin jî gelekî tê de hebû. Melayê Cizîrî li Cizîrî Bota dima. Li wir li malê bêhtir ne dima. Ji ber vê yekê jî birayê wî ye ku biçûk bû li wî malê dima. Birayê wî yê biçûk bi nav digotinê Semîr. Lê birayekî din jî hebû û ji wî ji biçûktir bû. Ew jî navê wî Nebî bû. Piştî Melayê Cizîrî, yê mazin û Semîr bû. Di nav civatan û guftûgoyan de li gotina wî baş dihate hesandin. Piştî ku Melayê Cizîrî çûbû ber bi Amedê ve, êdî dayika wan Kudu ku digihê ber dilovaniya Xwedê. Dayika wan gelekî rêz jê re dihate girtin. Malbavê wê li Cizîra Bota bû. Malbavê wê ji koka xwe ve digiha mala Mîrê Bota. Ew bi xwe jî yeka di nav civatan de xwedî gotin bû. Gelekî jî xweşik bû. Xiftana rengîn jî her dem lê bû. Keçeke wê jî hebû û navê wê Sosin bû. Keça wê piştî ku digihê demê mêr, digihê kurê Mir. Mîrê Kudu jî navê wî Mihemed bû. Mihemed jî serekê eşîrekê bû. Ew bi xwe jî kurê axê bû. Gava ku bavê wî digihê ber dilovaniya Xwedê, divêt ku Mele bikeve di dewsa wî de. Lê rê dide birayê xwe yê ku ji wî biçûktir bo vê yekê. Bîrayê wî jî her weha dikeve dewsa bavê wî de. Di rastiye de yê mazin ew bû. Diviya bû ku ew ketiba cihê bavê xwe de. Lê wî xwe da xwandinê. Ew û birayê wî her dem bi hev re dewletî bûn. Birayê wî li gotina wî dihesand. Her weha Mihemed ta dawiya jiyane xwe berdewam dike. Lê gava ku digihê ber dilovaniya Xwedê, êdî birayê wî Semir dikeve dewsa wî de. Semir çawa ku bavê wî weke begekî bû û mirov her weha didît ew jî wilo dihate dîtin û naskirin. Çawa ku Mihemed rê dabû birayê xwe yê biçûk, her weha Melayê Cizîrî jî rê dabû wî. Mirov car bi car digotiyê Semir Beg. Xatûna wî navê wê Zerîn bû. Zerîn gelekî xweşik bû. Ew bi xwe jî yeka ruyê wê fireh bû. Hinarokên wê her dem sor bûn. Lê sorkirineke xwezayî her weha li ser rûya wê hebû. Pora wê

dirêj bû. Keziyên xwe jî dihonandin, hemawîyeke sor û yekê şîn jî ji keviyê ve di nav pora xwe de dihonand. Gava ku dihûnand jî milikên xeftanê xwe di ser de bi hevdu ve girê didê û dibarda. Car bi car ji weke keçên ku ji nû ve digihan, pora xwe hine fikir. Li pêşiya vê jî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtîn ku her dem hinek qeranezên ku di sikra wê de bûn dihatine dîtîn. Qeranezên ku di sikra wê de bûn yê nivê, ku li ser singa wê bû mazin bû. Lê ji herdu aliyên sikrê ve ku ber bi jore ve diçû, ta ber bi ber qamçike ve biçûk dibûn. Wê her weha cil û qeranezên xwe bi xwe re gelekî baş kiri bûn ber hevdu de. Her weha gava ku lê dihate meyizandin, gelekî yeka ku lihevhatî dihate ber çavan. Ew bi xwe jî yeka ku bi xweşikatiya xwe re li hevhatî bû. Her dem jî xwe xwe li hev dide û derdikete hevberê mirov. Ne dihêşt ku mirov wê paşpalî bibînin. Ew bi xwe jî ne yeka ku paşpalî bû. Gelekî jî hez ji peyayê xwe fikir. Gava ku wê hev mar bikirina jî, hê berî hingê bi hev re hevdîtina wan hebû. Wan hez ji hevdu kiri bûn û bûbûn jin û mêrê hev. Di wê demê de jî gava ku li wan dihate meyizandin, dihate dîtîn, ku hê weke wê roja pêşî hez ji hevdu dikirin û her wisan li hevdu dimeyizandin.

Piştî ku Mihemed û Melayê Cizîrî û yên ku bi wan re hati bûn odeya rûniştinê êdî bi hev re dest bi axiftinê kiri bûn. Lê bêhtir Melayê Cizîrî dipeyivî û mirov lê dihesandin. Mirovê ku hati bûne wir, xwasti bûn ku li wî bihesênin. Ew ji ber vê yekê hati bûn. Mihemed jî di cihê xwe de rûnişti bû li wî dihesand. Gava ku Melayê Cizîrî dipeyivî, Mihemed bala xwe ji ser wî ne dibir. Axiftinên Melayê Cizîrî gelekî di serê Mihemed de cih digirtin. Melayê Cizîrî jî car bi car çavên xwe dibirine ser wî û li wî dimeyizand. Bala Melayê Cizîrî li ser wî bû. Melayê Cizîrî gava ku axiftina xwe hew dike, li Mihemed

dizivire û dibêje: ‘ De ka vêca tu jî hinekî ji me re bêje da em jî hinekî ji zanebûna te hildin. Min li te hisand li mizgeftê û min dît ku te gelekî xwandiye û yekê zane yî. Mirov ku çendîn bixwîne, divêt biaxiftin be jî. Ma ne wilo?’ Gava ku Melayê Cizîrî her weha dipeyivî, êdî Mihemed jî dest bi axiftinê kir û her weha ji Melayê Cizîrî û mirovên li li civatê got: ‘Mamosteyê hêja! Rast e, mirov bi zanebûna xwe re zane û jîr e. Ez ji aliyê Colemêrgê dihêm ku herime Cizîra Bota. Xwasteka min ew bû, ku Meleye xwe bibînim. Gava ku ez dihatime vir, di riya xwe de ez li gelek cihan ku navê mamosteyê min lê dihat ser zimên buhurtim. Ez hatime Ayserê jî. Ji wir bi rehberiya Mele Şefîq re nuha em li mala Meleyê xwe ne. Hevalên min yên din jî, ez di rê de rast li wî hatim’ Her weha gava ku Mihemed dipeyivî û axiftina xwe hew kir û pê de, Melayê Cizîrî carekê din peyivî: ‘Tu gelekî bi xêr hatî! Hûn tev bi xêr û xweşî hatin! Tu hê ciwan î. Lê tu bi zanebûn î. Min ev yekê fahm kir. Bi min re wan mirovên ku li te hesandin, ji te têgehîştin ku tu zane yî. Madem ku tu wê herî Cizîra Bota were em bi hev re herin. Ez jî divêt ku sibe herim.’ Piştî ku Melayê Cizîrî ev yek got ji Mihemed re Mihemed pir dilxweş bû. Bi wê dilxweşiya xwe re, rûken li nav çavên Melayê Cizîrî dimeyizand û gotiyê: ‘Mamosteyê min! Heger em ne bin bar ji we re, belê, ez bi dilxweşî dihêm bi we re. Ez pir dixwazim ku bi we re riya xwe berdewam bikim.’ Her weha Melayê Cizîrî û Mihemed piştî ku hinekî ji xwe re di nav civatê de diaxifin, êdî riya xwe ya Cizîra Bota kiri bûne yek ku wê bi hev re biçûna. Mihemed ji aliyê gotinê ve gelekî pêşketî bû. Gotinên ku ji nav lêvên wî derdiketin weke beytan di serê mirov de diman. Her wek peyvên ciwan ên Melayê Cizîrî. Herdû jî di nav civatê de nêzîkî hevdu rûnişti bûn û bi hev re gotûbêj dikirin. Mihemed gava ku axifti bû navê seydayê xwe jî ji

wan re Goti bû. Êdî bala mirov hê bêhtir çûbû ser wî. Mirovên ji herêman gelek seydayê wî nas dikirin. Ji wan mirovên ku di civata Melayê Cizîrî de rûnişti bûn jî, ku seydayê Mihemedî nas dikirin hebûn. Melayê Cizîrî jî ew nas dikir. Melayê Cizîrî gava ku carekê çûbû Bazîdê nig Mir Mihemed Begî, li wir hev dîti bûn. Mir Mihemed Beg Melayê Cizîrî li nig Mîrê Bota nas kiri bû. Piştî ku ew nas kiri bû êdî xwasti bû ku Melayê Cizîrî were nig wî û bibe mêhvane wî. Her weha gava ku Melayê Cizîrî jî diçe mêhvanderiya Mir Mihemed Beg li wir rastî Seydayê Mihemed yê ku bi nav jê re digotinê Mele Hemedê Zivingî têt. Melayê Cizîrî gava ku rastî seydayê wî têt, bi hev re dimênin. Lê bêhtir jî li nig hevdu na mênin. Gelekî û gelekî jî di dilê hevdu de cih digirin û ji hev diveqetin. Gava ku ji hev diveqetin, hevdu ji bîr na kin di demê de. Melayê Cizîrî hê ew ji bîr ne kiri bû. Gava ku Mihemed bahsa wî kiri bû, di cih de ew hati bû hişê wî. Piştî ku Mihemed bahsa wî kiri bû êdî hinekî jî li ser wî bi hev re dipeyvîn. Seydayê wî jî gelekî ji faqiyên xwe re bahsa Melayê Cizîrî dikir. Her weha Mihemed jî gelekî der barê Melayê Cizîrî de ji seydayê xwe hez kiri bû. Melayê Cizîrî li herêman gelekî bêhtir û zû hati bû naskirin. Mirov ku çûba nig Mîrê Bota jî piraniya wî ji gotinên wî û bi dîtina wî re nas dikirin. Ew bi xwe li herêmên Kurdistanê gelek geriya bû. Ew gerandina wî, wî mazin dabû naskirin di nav xelkê de. Mirov gava ku ew dîti bûn, gelekî lê hesandi bûn û jê hîkarî wergirti bûn. Her weha Melayê Cizîrî, êdî mazin têt naskirin. Melayê Cizîrî divêt mirov bêjê, ku li gelek herêman di civatên mîran, began û axayan de mabû û xwe dabû hesandin. Bi vê yekê re mirovên wan herêman, êdî ew mazin nas kiri bûn. Melayê Cizîrî bi gotinên xwe re di serê mirovan de xwediyê cihekî ku gelekî mazin bû. Piranî jî gava ku bûbû seydayê

Medresa Sor, êdî hê bêhtir ji aliyê mirovan ve hati bû naskirin. Mirov gelekî bahsa wî dikirin. Êdî qor bi qor dihatine nig ku wî bibîn.

Melayê Cizîrî û Mihemed her weha demeke xweşj bi hev re dibuhurîn. Piştî ku Mihemed hati bû nig wî û wan jî hevdu dîtî bûn û bi hev re çûbûn malê, êdî pê de ji xwe re rûnişti bûn û bi hev re dest bi axiftinê kiri bûn. Gava ew hati bûn malê, gelek mirovên din jî bi wan re hati bûn malê. Hemû jî bi hev re li hevdu rûniştîbûn. Di wê heyama axiftinê de Melayê Cizîrî jî gelekî ji Mihemed hîkarî wergirti bû. Mihemed xwediyê zanebûneke mazin bû. Melayê Cizîrî jî vê yekê fahm kiri bû û ne weke feqiyekî, yan jî yekê ku nû bûbe mele. Lê weke mirovekî ku zanistvan be, tevdi gere. Di rastiyê de jî Mihemed mirovekî zanistvan bû. Vê yekê jî, wî bi zanebûna xwe re ji mirovan re danî bû holê. Li nig Melayê Cizîrî ji her weha zanebûna xwe danî bû holê. Gava Mihemed û Melayê Cizîrî bi hev re dipeyivîn, Melayê Cizîrî çî pirs ji wî kiri bû, wî jî bersiva wî baş û têr dabû. Vê yekê jî hem bandûr li ser Melayê Cizîrî kiri bû û hem ji baweriya wî ya ku derbarê wî de xurt kiri bû. Her weha Mihemed û Melayê Cizîrî ta ber êvarî li hevdu rûnişti bûn û dipeyivîn. Gava ku bi hev re çû bûn û nivêjên êvarê (eşayê) kiri bûn, êdî pê de dîsan hati bûn û li hevdu rûnişti bûn û axiftina xwe berdewam kiri bûn. Her weha ta şev dereng şiyar mabûn û bi hevdu re guftûgo kiri bûn. Piştî ku diçin razên, Melayê Cizîrî hinekî din jî şiyar dimîne û li ser Mihemedî dikeve di nav hizirandinan de. Melayê Cizîrî wê şevê ta nîvê şevê şiyar mabû û li ser Mihemed hizirî bû. Wî çî jê pirsî bû, Mihemed jî bersiv dabû. Vê yekê jî di serê wî de ew dida mijûlkirinê. Melayê Cizîrî li gelek cihan geriya bû û gelek mirovan dîtî bûn. Wî mirovên dixwandin ji gelek dîtî bûn. Yê ku didîtin hema bêjê bi hemûkan re



jî dipeyvî. Lê yekî jî ji wan weke Mihemed di serê wî de evçend cihê mazin ne wergirti bû. Melayê Cizîrî mirovekî ku bi meraq bû. Ji xeynî vê yekê jî, bi çendî ku bi mirovên zanistvan û mazin re dipeyvî û hizra wan dihilda û fahm dikir, ewçend jî bi xwendekarên xwe re jî didipeyvî û hizir û zanebûna wan fêhm dikir. Gelek caran jî di nav ciwanên ku li nig wî dixwandin û fêr dihildan, dikete guftûgoyan de û hizir bi wan re dida ravekirin. Her weha divêt mirov bêjê ku Melayê Cizîrî hez ji guftugoyan dikir. Gava ku Mihemed jî hati bû nig wî, bi Mihemed re jî her weha diket guftûgoyan de. Bi guftûgoyan re hizir û zanebûna Mihemed fahm kiri bû. Wê şevê ku Mihemed li wir ma bû, gelekî li ser wî dihizirî. Hebûna Mihemed li ber çavên wî jîndar bû. Melayê Cizîrî piştî ku şev belav bûbû û ew jî di odaya xwe ya rûniştî de tenê ma bû, êdî keti bû nav behra hizran. Di wê dema ku di odayê de ma bû, hinekî hizirî bû û pişt re xwasti bû ku hinekî li pirtûken xwe jî bimeyizêne. Lê bêhtir ni kari bû, ji ber ku çavên wî êdî bêhtir ne didîtin ji ber xwandina bêhtir. Li ser xwe jî gava ku bêhtir dima, laşê wî diqerimî. Bi vê yekê re jî êş di laşê wî de dest pê dikir. Ji ber vê yekê ni kari bû ku bêhtir rûniştî jî bimîne. Lê wê şevê dixwast ku bimîne. Her weha xwesteka ku keti bû dilê wî de, bi wî re bû. Bi vî awayî Melayê Cizîrî, ta ji nivê şevê mele bangdana li serê beyaniyên sibehê dimîne. Piştî ku bangdana sibehê dibe û ew jî nivêja xwe dike, êdî pişt re dike ku hinekî xwe dirêj bike. Her weha piştî nivêja xwe re xwe dirêj dike û dikeve xewê de. Gava ku dikeve xewê de, dimîne di xewê de ta ku dibe nêzîkî dema taştê. Berî ku bibe dema taştê, hinek hê zûtir dirabin ser xwe ji xewê û xwe amede dike û dikin ku herin odeya ku têde taştê bêt kirin. Gava ku Melayê Cizîrî xwe amede dike û dike ku ji odaya xwe ya rezanê derkeve, ku here odeya taştê têde, di devê derî de, rastî Mihemed

têt. Mihemed ji xewê wek her car zû rabû bû. Lê di odaya xwe de mabû, ta ku mirovên din jî ji xewê rabû bûn ser xwe. Gava ku dîti bûn, ku mirovên din wa ne ji xewê rabûn, êdî ew jî ji odayê derketi bû ku here nig wan. Her weha gava ku ew jî ji odaya xwe ye ku têde raza bû, kiri bû ku derkeve, li devê derîyê odê rastî Melayê Cizîrî hati bû. Gava ku herdûkan rastî hevdu hati bûn, êdî pêşîkê rojbaşî ji hev re kiri bûn û pişt re dabûne rex hevdu ku herine odeya mazin, ya ku wê têde taştê bikirana. Gava ku diçin û digihine odeya ku wê têde taştê bikin û li ser sifra ku ji wan re hati bû amedekirin dirûnin, Mele Şafiq û Kêşê Tuma dihên. Ew jî gava ku dihên rojbaşî dixwazin û bi wan re li ser sifrê dirûnin. Gava ku ew jî tên û dirûnin Melayê Cizîrî dibêjê wan, ku dest bi xwarina taştê dikin. Piştî ku dest bi xwarinê dikin, Melayê Cizîrî li Mihemed dizivire û dibejiyê, ku di wê rojê de bi rêkevin û herin Cizira Bota. Mihemed di rex Melayê Cizîrî de rûnişti bû. Gava taştê dikin Mihemed bala wî li ser Melayê Cizîrî ye. Di wê heyamê de Mihemed dibîne Melayê Cizîrî weke ku ji cihêla xwe ve aciz bû, dihate xuyakirin. Ew cihêla wî ya rast e bin çengê wî û di dehma dilê wî de weke ku êş hebû, dihate xuyakirin. Car bi car jî Melayê Cizîrî destê xwe diavête wê cihêla xwe û pê re weke ku ruyê xwe diqirmiçand. Mihemed gava ku wî dibine ku acizbûn pê re heye, ji wî dipirse ku ka çi yê wî heye. Lê Melayê Cizîrî dibêjê ku tiştêkî wî dijwar nîn e. Her weha ji wan re dibêjê ku dibe ku ez bêhtir li ser ve cihêla xwe şevê mame ji ber wê yekê jî hinekî diêşê. Piştî vê yekê êdî tiştêkî din na yê gotin ji aliyê wî ve. Lê bala Mihemed her weha ji bo vê rewşê çû bû ser wî di wê heyamê de. Her weha ta ku taştêya xwe hew kirin jî, bala Mihemed li ser wî ma bû.

Piştî ku taştêya xwe dixwin, dibuhurin odaya rûniştînê ku hinekî ji xwe re rûnên. Di wê heyamê de ji karê Melayê Cizîrî û wan dihate

kirin, ku wê bi rê ketiban ku çûban Cizîra Bota. Her yekê ji wan re hespek têt amedekirin. Ji Melayê Cizîrî re ji hespekî ku mahîneke sipî têt amedekirin. Hinekî mirovên din jî yên ku her dem bi Melayê Cizîrî re diman û ku sofî bûn, wan jî karê xwe dikirin ku wê pê re biçûna. Ji wan re hinek hûrmûr jî dihatine amedekirin ku wê bi xwe re biribana. Ji bo barê hûrmûran jî hinek hespên din ji bi hinek rehberan re dihatine amedekirin. Melayê Cizîrî wan deran tev nas dikirin. Lê bi têne û destvala jî ne dihate şandin. Ji ber vê yekê jî hinekî amadekarî ji bo çûna wî dihate kirin. Her weha ku weke heyamekê piştî taştê dirûnin êdî nûçe ji Melayê Cizîrî re têt ku wa ye amadekarî çûne hewbûnê. Gava ku nûçer ji wan re têt, êdî ew jî karên xwe dikin û pirtuk û nivîsên xwe didine hevdu û dikine turikên xwe yê rê û dirabine ser xwe ku derkevîne derve û bi rêkevin. Gava ku dirabin û dihêne ji derve, dimeyîzênin ku hespên wan hatine amedekirin û li hêviya wan in ku herin û li wan suwar bin û bi rêkevin. Ew jî gava ku her weha dibînen, ku wa ne hespên wan amade ne, êdî ew jî diçin û li hêspên xwe suwar dibin û yên ku wê bi wan re bikevine rê de ew jî li hespên ku ji xwe re amade kirine suwar dibin û bi hev re ji maliyan xatirên xwe dixwazin û dikevîne rê de ku herine Cizîra Bota. Mihemed bêhtir hez ji suwarbûna hespan ne dikir. Lê ew jî di wê kêlîkê de li hespekî suwar bû bû. Gava ku ew li hesp suwar dibe, ji hespê dikeve, rex hespê Melayê Cizîrî. Bi hev re dikevîne rê de û diçin ku herine Cizîra Bota. Li ser hespan gava ku diçûn, bala Mihemed li ser Melayê Cizîrî bû. Gava ku li Melayê Cizîrî dimeyîzand, didît ku hinekî bêrewşî pê re hebû. Vê yekê jî bala wî baş û mazin dikişande ser wî. Çend ku diçûn û ji gund dûr diketin, dihatê dîtin, ku hê bêhtir bêrewşiyekê bi Melayê Cizîrî re xwe dida nîşandan. Di rê de gava ku heyamekê diçin, êdî

digihîjine ber çemekî, ku ava wê diheriki ser ava Diclê. Gava ku digihîjine ber çem, hinekî li wir dirawestî û bêhna xwe distênin. Melayê Cizîrî û yê ku pê re ne, ji hespan peya dibin, ku hinekî bêhna xwe divekin li ber wî çemî. Melayê Cizîrî têt ser wê avê û hinek av diavêjê ruyê xwe û hinekî jî di devê xwe de diwêrde û divexwe. Gava ku weke qederekî li ser wê ava çem dimênin, êdî carekê din li hespên xwe suwar dibin û dikevîne rîya xwe de ku herin. Di rê de gava ku diçin hinekî ji xwe re dipeyivî jî ta ku dihêne nêzîki Cizîra Bota. Rîya wan bêhtir ne dûr bû. Lê wan jî bi dilê xwe û bi hêdîka rê çû bûn. Gava ku digehîjine Cizîra Bota, êdî hinekî weke ku bêhn distênin li wan têt. Lê Melayê Cizîrî gava ku lê dihate meyizandin, dihate dîtî ku hinekî nebaş dihate xuyakirin.

Pêkve dihêne navênda Cizîra Bota êdî keşe Tuma jî ji wan xatir dixwaze û bi rîya xwe de diçe. Lê Mihemed û Melayê Cizîrî û yê ku bi wan re bûn, bi hev re rîya Medresa Sor digirin û diçine Medresa Sor. Her weha piştî ku digihîjine navêndê, êdî hinekî rê diherin û diçin û digihîjine Medresa Sor. Melayê Cizîrî û Mihemed gava ku dihêne Medresa Sor, bi hev re hinekî ji xwe re dikin ku rûnên. Lê dibînin ku rewşa Melayê Cizîrî hê bêhtir xira bûye. Her weha Melayê Cizîrî û Mihemed li medresê ta ber bi êvarê li hevdu dirûnin û dikin ku bipeyivîn. Di wê heyamê de nûçe çûye ji Mîrê Mazin re jî, ku Melayê Cizîrî hatiye. Gava ku Mîrê Mazin seh dike, ku Melayê Cizîrî hatiye, ew jî têt nig wî. Gava Mîrê Mazin jî têt Medresa Sor, êdî civat li Medresê digehîje hev. Lê têt dîtî, ku hin bi hin rewşa Melayê Cizîrî ji xirabtir dibû. Piştî heyamekê Melayê Cizîrî êdî na ke ku bipeyive. Ni kare di rûniştina xwe de, xwe li ser xwe bigire. Melayê Cizîrî her weha di nav mirovên ku li dora wî de bûn, ji xwe diçe. Gava mirovên dora wî dibînin ku rewşa wî pir giran e, êdî dirahêjinê û ew

dibine ser cih. Melayê Cizîrî bihna wî jî hêdî hêdî kê m dibû. Gava ku ew hati bû dirêjkirin li ser cih, Mihemed jî li ber serê wî rawestiya bû. Hin bi hin tarîti di çavên Melayê Cizîrî de dihat. Ew kêlik, kêlika dawiyê bû ji bo Melayê Cizîrî. Êdî ev yek, ji aliyê mirovên li wir bûn jî, baş di hate têgehîştin. Melayê Cizîrî di wê kêlikê de, hê çavên wî bi yekcarî tarî ne bû bûn, li nav çavên Mihemed meyizandi bû û her weha jê re Goti bû: 'hizra jiyane û rastiyan jiyane li vir bide van mirovan'. Mihemed ev gotin hîs kiri bû û fahm kiri bû. Pişt re bi yekcarî çavên Melayê Cizîrî diçine ser hevdu û behna wî êdî naçe û na yêti û bihn bi yekcarî diçike. Êşa wî dikeve di dilê mirov de. Melayê Cizîrî êdî giha bû ber dilovaniya Xwedê. Melayê Cizîrî gava ku ji dunyê koç kiri bû, 76 salî bû. Piştî ku Melayê Cizîrî digehê ber dilovaniyê jî, ji Medresa Sor na yêti veqetandin. Tirba wî li Medresa Sor têt avakirin û ew li wir têt bi cihkirin.

Melayê Cizîrî di sala 1642'yê de çavên xwe li jiyane dimiçîne. Barkirina Melayê Cizîrî ji nav me, gelekî dilê mirov diêştîne. Piştî ku Melayê Cizîrî digehîje ber dilovaniya Xwedê, êdî li Medresa Sor domaneke nuh bi Mihemed re dest pê dike. Jiyana Mihemed êdî bi dema xwe ya zanistiyane li Medresa Sor, li Cizîra Bota dest pê dike. Jiyana wî, ji wir û pê de êdî bi çendî zanistvaniya wî, evînekê jî dike nava xwe de û her wisan berdewam dike. Ew ê ji wir û pê de, evîndarî û rastî, hizir û gotin, zanistvanî û jiyane, mazinatî û mirov, di jiyana wî de bi wî re were ser zimên.

DAWÎ

\*\*

GARDIYAN

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

NEFEL

Gardiyani

1

GARDIYAN

2

GARDIYAN

Gardiyani

BÛBÊ ESER

NEFEL

Stockholm

2002

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

3

GARDIYAN

Bûbê Eser: Gardiyani

Weşanxane: Nefel

Sandfjârdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

© Bûbê Eser û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-973195-9-7

Çapa kevin: Roja nû

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike  
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

## GARDIYAN

Ji bo keça min Rojbînê

I

Sîdar xwendevanekî unîversîteyê bû, wî li Ankarayê, beşa rojnama-  
vanetiyê dixwend. Ji gundên wan tenê wî û pismamekî xwe, xwe gi-  
handibûn heta unîversîteyê. Ji ber ko rewşa mala Sîdar ya aborî ne  
baş bû;

wî him di daîreyeke dewletê de kar dikir û him jî unîversîteya xwe  
dixwend. Her weha çavê malbata wî li riya ko ew unîversîteya xwe  
biqedîne bû. Sîdar, rojek ji rojên zivistana Diyarbekirê, ya sala 1980-  
ê dî

duduyê meha sibatê de hate girtin.

Sîdar bi qîzeke ne kurd re zewicîbû; Jina wî li bajarê Diyarbekirê, di  
nexweşxanê de hemşîre bû; Ew bi xwe ne tirk bû, ew Laz bû, lê  
tirkan ew

asîmle kiribûn, zîman û çanda wan weke ya tîrkan dîdan nasandîn.

Loma

Piraniya wan êdî xwe weke miletekî din nas nedikirin. Wan êdî xwe  
tirk

dizanîbûn.

Di dema zewaca wan de, him li Tirkiyê û him jî li Kurdistanê doza şoreşgerî gelekî bilind bû û ji ber ko ew herdu şoreşger bûn wan bi serê

xwe biryara zewaca xwe dabûn. Piştî naskirin û jî hevtêgihiştinê, mal-

batên xwe di vê derheqê de agahdar kiribûn. Di demeke kurt de daweta

xwe li dar xistin. Wan jî weke her bûk û zavayekî nû, xwestin ko bi mi-

radê xwe şa bibin. Lê ev şabûna wan î bi hev re qasî du mehan dom kir.

Dûre Sîdar hate girtin, hevala wî bi tena serê xwe ma. Di zewaca şoreşgerên wê demê de, tu garantiya ko kesên zewicandî, heta taliya

jiyana xwe bi hev re bijîn, tunebû. Loma hevala Sîdar xwe ji vê rewşê qet

aciz nekiri bû, ji ber ko berî ew bi hev re bizewicin, tu sozên ko ew ê qet

ji hev neqetin nedabûn hev. Di vê bîr û baweriyê de, hevala wî Hava xwest ko vê jiyanê bi tenê, li hemberî hemû xweşî û nexweşîyan, bi bîr û

baweriyên xwe, li gel mêrê xwe bijî.

5

GARDIYAN

Belê Sîdar hîn zavayekî dumehî bû ko hatibû girtin. Wî demên xwe



yên zavatiya nû, di girtîgehê de derbas kir, ma kê zanîbû ko piştî zewacê

bi du mehan ew ê bête girtin. Lê ev yeka hate serê wan, ji xwe kesên wê

demê yê şoreşger û welatparêz, her dem xwe ji girtinê re hazir dikirin,

Sîdar jî ji wan kesan yek bû, ko hatibû girtin.

Sîdar di nozdehê meha Gulana sala 1983-an de hate berdan. Piştî berdana xwe xwest, ew miradê ko nîvco mabû tamam bike, yanî zavatiya

xwe ya du mehî piştî du sal û şeş mehan bidomîne. Lê gelekî mixabin ko

piştî berdana wî, polîsan tu rehetî nedayê, carna gazî wî dikirin, ew dibirin qereqolê, carna li sûkê li wî mêze dikirin, dimizmezîn, weke bêjin:

»biner, tu her dem di bin çavderiya me de ye«, bi vî awayî hemû rojên

Sîdar di bin çavderiya polîsan de derbas dibû. Piştî demekê û pêde Sîdar

baş tê ghişt ko wê nikaribe di rewşeke weha de li bajarê Diyarbekrê bijî,

ji ber ko ew her dem dikarîbû bihata girtin.

Dema Sîdar di girtîgehê de bû keçeke wî çê bû bû, diya wê nav lê kiribû, Rojbîn. Rojbîna wî bîr nedibir ko bavê wê di girtîgehê de ye, wê

jî weke her zarokê, dixwest ko bavê xwe li ba xwe bibîne, lê wê tenê

dikarîbû bavê xwe di girtîgehê de, di nava têlên bî de kelem bidîta.

Piştî hewqas tade û êşkencan, dema Sîdar ji girtîgehê derket, wî  
xwest  
ko demekê li Diyarbekra şirîn, li gel qîz û hevala xwe bijî, lê hingî  
polîsan  
li wî dipirsîn û çavderiya wî dikirin, ew tê ghiştin ko ew ê nikaribe li  
Diyarbekrê bijî, loma jî bi alîkariya xalê xwe, wî tayîna hevala xwe  
derx-  
ist hêla Behra Reş, ew li nahiyake bajarê Trabzonê, bi cih bûn, li wir  
biyanîtiya Sîdar ya cara yekem dest pêdikir.  
Nahiya ko ew lê bi cih û war bûn; Fabrîqeyeke çayê, qereqol,  
nexweşx-  
ane û lîseyek lê hebû. Loma jî mamoste, doktor û memurên wir  
gelek  
bûn. Li wir mirov dikare bêje ko piraniya mêran karên wan hebûn,  
hin  
mamoste bûn, hina di fabrîqê de kar dikirin, kesên ne memûr bûn  
jî di  
zeviyê çayê de dixebitîn, di vê rewşa taze de, li wir tenê Sîdar bê kar  
û şix-  
ul bû. Loma pêwîst bû ko Sîdar ji xwe re rêyek bidîta, ko ji wê  
bêkariyê  
xilas biba.  
Li wir ji bona Sîdar, jiyaneke nû û gelek zor dest pê dikir, ew bi xwe  
nuh  
ji girtîgehê derketibû, ne kar û ne jî pereyên wî hebû. Bi ser vê de jî  
ew ji  
Universîteya ko wî dixwend, hatibû avîtin. Ew mecbûr mabûn ko li  
wî

cihê biyanîtiyê, tenê bi maaşê jînê îdare bikin, him li hember hemû  
teda

û cefayê, tekoşîneke nû destpêdikir him jî jiyana biyanîtiyê. Lê tiştê  
herî

zor ew bû ko bi yek maaşî li wir jiyana wan bû, ya herî zahmettirîn  
û zor-

6

## GARDIYAN

tirîn jî ew bû ko mêr li mal bê karûbar û jinê jî kar dikir, ev jî tişteki  
gelekî

çewt bû ko mirov bikarîba li hêla Derya reş bi awayekî azad bijiya, ji  
ber

ko gelekî şerm bû ko li wê heremê mêr betal ba û jinê jî kar bikira.

Ew ketibûn tengasiyake mezin, him wan ne dixwestin ko mirovên  
wir,

raberduyên (serborî, mazî) wan bizanibin, him jî pêwîst bû, ko wan  
bi

rêyekê ev problema xwe çareser bikirana. Lê bi çi riyê, wan jî  
nizanîbûn,

tenê di ser hev de diponijîn û difikirîn ko çareyekê, rê û rêbazeke ji  
bêkariya Sîdar re bibînin.

Piştî fikirandineke dûr û dirêj wan riya xilasiya xwe di derewekê de  
dîtin. Eger derewa wan ji alî rûniştvanên heremê ve bihata  
bawerîkirin,

ew ê ji vê tengasiyê xilas bibana. Wan derewek weha ji xwe re  
peyde kirin

ko jiyana wan a wir bi wê derewa ko kiribûn, hatibû girêdan. Eger  
plana  
wan yanî derewa wan bi cih biba wê bikarîbana, li wê biyanitîyê  
heta de-  
mekê jiyana xwe bidomandana, lê eger derewa wan cihê xwe  
negirta  
karên wan ê gelekî zahmet ba. Piştî ko wan derewa xwe ya ko wan  
hemû  
hêviyên xwe jî pêde girêdabûn, ji der û dora xwe re gotin û ew  
derewa  
wan bi cih bû bû. Loma êdî baweriya rûniştevanên heremê, çê bû  
bûn ko  
ew tiştên ji alî Sîdar û hevala wî de hatibû gotin rast e. Ji ber vê  
sedemê bû  
ko heta ew li wir man, bi saya serê wê derewê bi awayekî normal  
jiyana  
xwe domandin.

Berî girtina xwe Sîdar, li unîversîteyê beşa rojnamegeriyê dixwend,  
unîversîtêya wî li paytextê tirkiyê yanî li bajarê Ankarayê bû. Dema  
ko ew  
hatibû girtin, ji unîversîtêya xwe hatibû avîtin. Wî sê salan  
xwendibû.

Sala wî ya dawîn bû ko wî ê xwendina xwe biqedanda û ew ê biba  
burokratek. Ji ber ko çavên malbata wî, dost û hevalên wî li benda  
xilas-  
bûna xwendîna wî bûn ko ew alîkariya wan bike. Qedandina Sîdar ji  
uni-

versîtêyê wê kêfxweşiya dost û hevalên wî ba. Lê neqediya. Her çiqas wî

universîteya xwe neqedandibû jî, bi saya serê wê, ew li wê herêma Derya

Reş, li gel malbata xwe qederê heft mehan bê problema girtinê, lê bi

awayekî birçî û tirs jiyana xwe domandin. Loma ew derewa ko wan kiribûn, ji wan re bû bû weke riyê nû, weke riyê azadî û xelasiyê, ew bû

sebeb ko Sîdar li gel qîz û hevala xwe li hêla Derya Reş, demeke jiyane buhurandî.

Şevê ji şevên payizê, ko qîza wan razabû, hay û bala wê ji bayê felekê

tunebû, wê nizanîbû ko bav û diya wê di çî rewşê de ne, wê nizanîbû ko

dê û bavê wê, wê çawa xwe ji vê rewşa ko niha têdene, azad bikin, loma

ew ketibû xewa xwe ya şîrîn, Sîdar û Hava bi ser hev de diponijîn, ko ew

7

GARDIYAN

ê bi çî awayî bikaribin rîyê nû ji xwe re peyde bikin, ew ê çî bikin ko ji

vê rewşa nebaş xilas bibin. Loma ew gelekî bi ser hevde fikirîn, ne xewa

wan dihat, ne jî karîbûn razana, ji ber ko piştî du rojên din Hava wê dest  
bi kar bikira. Rûniştvanên heremê wê bihatana xêrhatina wê, dema wan  
xêrhatin li Hava bikrana, wê rewşa mêrê wê bipirsiyana, ka ew çi karî  
dike. Piştî pirseke weha Hava wê nikarîba bigota ko »ew bê kar e«  
an jî ew  
»nû ji girtîgehê derketi ye« gotarên weha wê rewşa wan î wir zortir  
bikira,  
wê êdî kesî bi çavekî qenc li wan mêze nekirina, tu kesî wê qedr û  
qîmet  
nedana wan. Dema cihê ko mirov lê dijî, qedr û qîmeta mirovan li  
vir  
tune be, jiyana wir bê mane dibe. Piştî fikirandineke dûr û dirêj, bi  
ser  
hevde diponijin, carna ji wan yekî »digot gelo em weha bêjin wê  
çawa be,  
na wele em weha bêjin wê çêtir be« piştî çêkirina hin plan û dîtina  
hin  
riyan, kete bîra Sîdar ko wî demekê li unîversîtê dixwend, gelo dîsa  
bi  
sedema vê, wê nikaribin riya xelasiyê bibînin, dema ev kete bîra  
Sîdar  
rûyê wî vebû, keniya, hevala wî li wî mabû ecêbmayî û got:  
— Wa Sîdar, ma qey rewşa me gelekî xweş e ko tu dikenî.  
— Na na, got Sîdar. Min rêya azadiyê dît, ez weha bawerim ko ev  
plana

min wê rewşa me derxe ronahiyê, de ka ez ji te re jî bêjim ko tu çawa

dibîne?

Rêya ko Sîdar dîtibû, ji hevala xwe re weha şirove kir:

— Hava, weke tu jî pê dizane ko berî girtina xwe ez xwendevanekî uni-

versîteyê bûm. Eger niha tu têkiliyên min bi universîtê re nema be jî, di-

vê em weha ji der û dora xwe re bidin diyarkirin, ko ez kurê dewlemendekî me, malbata min naxwaze ko ez karê bin emir bikim, ji xwendî-

na min re salek maye, piştî qedandina wê, ez ê bibim rojnamavan û êdî ez

ê bi bîhneke fireh û seriyekî rehet karê xwe yê Rojnemageriyê bikim. Û

niha jî malbata min, di warê aborî de alîkariya min dikin. Ev pêşniyara

Sîdar ji alî jina wî de baş hate dîtin, ji xwe ji bilî vê jî tu rêyeke din ji wan

re nema bû. Loma wan biryara xwe dan ko ew kesên ji jina Sîdar bipirsin:

— Ma gelo mêre te çima bê kar e.

Bersîv diyar e. Ji xwe dema hina ji Sîdar bipirsiyana wî yê hîn bi rêk û

pêk mesala karnekirina xwe bi derewên xemilandî şirove bikira.

Bi vî awayî û bi saya serê wê derewa qelew, wan li heremê rûmet girtin,

baweriya her kesekî çêbû ko bi rastî jî Sîdar kurê dewlemenda ye û tiştê

ew dibên rast e. Sîdar carekê duduyan ji bo karekî taybetî çû Ankarayê.

Çûyin û hatina wî ya Ankarayê, bawerî da der û dorê ko bi rastî Sîdar unîversîteyê dixwîne, loma wan hîn bêtir rûmeta wî girtin. Ji xwe li here-

8

## GARDIYAN

meke şûndemayî, qedr û qîmeta, doktor, hemşîre û kesên xwendevanên

unîversîteyê gelek in.

Ew derewa wan bi awayekî qenc, di nava rûniştevanên wê herêma de bi

cih bû, Sîdar têkilî û hereketên xwe weke yên kurê zaroyê dewlemendan

dikir, her dem wî kincin paqij û xweşik, yên xwe yên berê, li xwe dikir.

Bêrîk vala bû, lê wî her dem peyvên qelew dikir. Bi vî awayî û bi saya serê

wê derewê îşê wan baş bû, serda jî xelkê navçê hîn hêvî jê dikirin û jê

alîkarî dîxwestin, wan dîgot: ji xwe jina wî hemşîre bû, heta ji destê wê di-

hat, wê jî têkiliyên gelekî germ û xweş bi kesên wê navçeyê re datanî, li wê



navçeyê di nexweşxanêeyê de weke hemşîreyekê karkirin bi serê  
xwe jî  
rûmeteke mezin bû. Ew navçe gelekî bi şûnde mabûn û tesîra dîn li  
ser  
wan gelek bû.  
Nexweşxane û sê lojmanên wê, ne di nava nahiyê de bûn, li derî  
nahiyê  
di nava daristanê de hatibûn avakirin. Nexweşxane li pêşiyê bû, di  
dû re  
lojmana Doktor a hemşîrê û ya din jî ya dadûkê (ebe) bû. Êdî Sîdar  
û  
malbata xwe jî li wir bi cih û war bû bûn, tiştên wan yê hundurê  
malê,  
yê di dema zewaca wan de mabûn. Ji ber ko wan ew tiştên xwe, di  
de-  
ma zewaca xwe de kirîbûn, piştî girtina Sîdar, Hava jî mala xwe dabû  
ser  
hev û çûbû cem kekê Sîdar yê mezin, ji ber vê yekê bû ko hîn tiştên  
wan  
nuh dihatin xuyakirin û bi kar nehatibûn anîn, bi xêra nuhbûna wan  
ala-  
van, mala wan xweş bû bû. Wan ew ji Diyarbêkrê tevî xwe anîbûn.  
Ji xwe  
tiştê ji wan re bû alîkar, kincên Sîdar yê nû û eşyayên mala wan  
bûn,  
kesên çav li eşyayê mala wan û kincên Sîdar diketin, baweriya wan  
zêde-  
tir dibû.

Her sibe Hava dest bi kar dikir, Sîdar û keça xwe li mal diman, heta ji

destê Sîdar dihat wî bi her awayî di karê malê de alîkariya hevala xwe

dikir, bi keça xwe re dilîst, di demên xwe yên vala de jî pirtûk dixwend,

dema hina dipirsîn:

— Gelo ew çî pirtûk in tu dixwînî.

— Ez dersên xwe dixebitim, da ko ez, zû universtitêya xwe biqedînim,

digot. Sîdar:

Li wê nahiyê, her roj saet sisiyên piştî nîvro, kar diqediya. Piştî qedan-

dina kar kesên memur diçûn qahwexanê. Li wir qahwexaneyek bi taybetî

bû bû weke ya hemû memûrên nahiyê. Piştî qedandina karê nexweşxanê

car carna Sîdar û dîktor û car carna jî Sîdar û memûrên din bi hev re diçûn qahwexanê. Bi vê munasebetê navbera Sîdar û karmendên nexweşxanê germtir bû bû.

9

GARDIYAN

Di nava memûrên navçê û di herêmê de Sîdar merivekî dewlemend û

xwenda dihate naskirin. Hurmet û hezkirina rûniştvanên wê heremê li

hemberî Sîdar roj bi roj zêdetir dibû. Ji ber ko wî gotibû ko ez roj-

namegeriyê dixwînim, gelek caran hin kes dihatin ba wî û digotin:  
»Sîdar

beg, eger te bi xêr xwendina xwe kuta kir, bûyî rojnamevan, ji kerema

xwe re derdên me jî di rojnameyan de binîvîsîne ko bila dewleta me li me

xwedî derkeve, rêyên me çêbikin.«

Gelek peyvên mirovên navçê dihat guhên Sîdar ko digotin:

»Mêrê hemşîra me, gelekî dewlemend e, malbata wî ji wî re gelek per-

an dişîne, ew jî niha universîtê dixwîn e, piştî ko biqedîne wê rojnamevaniyê bike. Loma malbata wî niha nahêle ko ew li ber destê kesên

din kar bike«.

Di vê bîr û baweriyê de wan, jiyana xwe ya biyanetiyê ya cara yekem qasî 6-7 meha domandin. Jiyana wan bi awakî weha xweş hate domandin

ko tu nema bû Sîdar biba mezinekî ji wir. Komutanê qerekola leşgeriyê

ya li wir bi xwe jî kurd bû, komutanê qerekolê ne digot ez kurd im û wî

tu daw û doza kurdiyatiyê nedikir, lê ji ber ko ew ji bajarekî Kurdistanê

bû, her kesên wê heremê ji wî re digot in ku:

— Komutanê me bi xwe kurd e.

Du kesên ko ji bajarekî Kurdistanê bûn, di fabrîka çayê de weke teknisiyen kar dikirin. Bi vî awayî têkiliyê Sîdar û yên wan herdu kesên

kurd û komutan bi hev re çê bûn, hevala Sîdar jî bi pîreka komutanê  
wir  
re têkiliyên xweş û dostanî danî, bi saya têkilêyên Hava û pîreka  
komu-  
tan, navbêra Sîdar û komutan hîn germtir bû. Bi saya van têkiliyan  
û bi  
hin tesadufan, li wir her ko çû, navbêra Sîdar û memûrên wir xweş  
bû, di  
derheqê wî de kesî nema şik dikirin, ji ber derewa ko wan kiribûn,  
cihê  
xwe girtibû û êdî kesî pirsar, »çima mêrê hemşîrê kar nake« ne  
dîkîrîn.  
Eger hinên nû ji rûniştvanên wir bi rewşa Sîdar nizanîbana, kesên  
din ji  
wan ra weha îzah dikirin:  
»Sîdar yanî mêrê hemşîra me, ji malbateke gelekî dewlemend e û  
ew bi  
xwe universîtê dixwîne, ev sala wî ya dawî ye, ko ew ê bibe  
rojnamevan«.

Sîdar, li wir him bû bû beg û him jî mezin bû bû, li gor wê mezinbûna  
xwe jî wî rûmet girtibû, lê dema mirov li jiyana wan î li wir mêze  
dikir,  
ko bêrîk vala û gelek caran zik birçî bûn, bi xêra mala xezûrê Sîdar,  
bi du  
zikê birçî yekî têr jiyana xwe li hemberî hemû derd û êşan  
didomandin,  
bi anîna erzaqên ji mala xezûrê xwe, di mala wan de tiştên xwarinê  
peyde

dibû. Ji ber ko li Trabzonê baxçê mala xezûrê wî hebû, wan her tiştê  
10

## GARDIYAN

xwarinê ji wir dianîn. Her çiqê du zik birçî û yek têr bû jî, dîsa Sîdar  
zêde

xem nedixwar, lewra ev jiyar, ji ya girtîgehê gelek qenctir û baştir  
bû, qe

ne be lêdan û tirsê kuştinê tunebû.

Hevala Sîdar, Hava, ji bona hezkirina mirovên wê navçê bigire, gelek  
caran zêdeyî taqeta xwe kar dikir. Bi kesên ko dihatin nexweşxanê  
re, bi

hurmet û rûmeteke mezin eleqedar dibû. Hemû rûniştevanên  
nahiyê û

her weha gundên der dora wan hemiyar navê hemşîra nuh ya ji  
bona

nexweşxana wan hatiye bihîstibûn, kesên ji vê rewşê ne agahdar  
bana jî,

ji yê din dibihîstin. Bi saya serê wê derewa wan û hemşîrebûna  
pîreka

Sîdar, ew êdî ketibûn nav memurên nahiyê, roja ko Sîdar neçûya  
qah-

wexanê gelekê pirsê wî dikirin û digot in:

»Gelo çima îro Sîdar Beg nehatiye«.

Sîdar, çûyina xwe ya Ankarayê weha dianî zimên: »Ez qet ji bîr  
nakim,

ko carekê çûme Ankarayê, berî çûyina xwe bi mehekê min ji der û  
dora

xwe re gotibû ko îmtihanên min hene divê ez vê meha pêşiya me herim

Ankarayê û têkevim îmtîhanên xwe, bi vê derewa cara dudan, him xwendevantiya min dihat îspatkirin û him jî çûn û hatina min bi rûmet

û bawriyeke din dabû kesên wir.

Ez ji bo karekî xwe çûbûm Ankarayê, qederê 20 rojan li wir mabûm de-

ma vegeyriyam malê, weke rojên berê, piştî qedandina karên resmî ez jî

weke her memûrekî, weke her car çûme qahwexanê, kesên wir bi dengekî

berz, yeko yek xêrhatin dan mîn û hatin destên min girtin, pirsra îmtîhana

min kirin...

Li wir şansa me baş çû bû, her weha gelek tesadufan jî alîkariya me kiribû, qaymeqamê qezê kurd derket, lê ew kes ne mirovekî qenc bû, ji

ber ko ew jî ji bajarekî Kurdistanê bû, dihate gotin ko ew kurd e. Car car-

na gundî dihatin ba min, tika ji min dikirin û digotin: »Em hatine ba te,

ko tu ji qaymeqamê hevvelatîyê xwe re bêje ko bila rêya gundê me çêbike.« Wan wer bawer dikirin ko ez ê bikaribim vê yekê bikim.

Carna

jî gundî dihatin ba min giliyê komutan jî dikirin. Tiştê herî baş ew bû ko

navê min û yê hevala min li wê navçeyê bi awayekî gelekî baş hatibû

belavkirin. Rûniştevanên wir ji hev re digotin:

»Ev hemşîra ko ji me re hatiye, firset û qismetekî qenc e, divê em vê

firsetê baş bi kar bînin, qedr û qîmeta wê baş bigrin, belkî bi saya mêrê

wê, em bikaribin rêya gundê xwe bidin çêkirin«. Û her weha axaftin û

peyvên weha roj bi roj bêtir belav dibûn.

Her roj ji serê sibê heta saet 15.00-an ez û Rojbîna xwe, em li mal di-

11

GARDIYAN

man, dema roj germ dibû, min pirtûkek digirt destê xwe, kursiyek datanî

derve, di bin wê tava germ û xweş de dest bi xwendinê dikir, kesê ko ez

didîtim digotin, belkî ez dersên xwe çêdikim, ji ber vê yekê, xwendina

min zêde bala kesî nedikişand.

Rojekê dîsa ez li derve rûniştîbûm, min pirtûk dixwend, him dixwend

û him di nava ramanên bê binî de ez çûbûm dinyayeke din, ko gelo em ê

çi demê ji vî halî xilas bin, gelo wê kengî dawiya vê rewşê bê. Carna min

xwe ji ramanan azad dikir, xwendina xwe didomand, carna jî çavê min

diçû ser saetê bê ka hela ew bû ye çî? Di nava raman û xwendinê de,  
dengê hate guhê min: »Sîdar Beg, Sîdar Beg« dema min serê xwe rakir,  
leşkerek nêzîkê min bû got: »Sîdar Beg, qomûtanê me got, here banî  
Sîdar Beg bike bila hetanî vir were« bi qedandina gotina wî nava min kir  
gupînî, tirs û xofekê ez girtim, ez ketim xeml û xeyalan. Min weha texmîn kir ko ji Diyarbekrê xebera girtina min hatiye, loma komutan şandiye pê min û bi awayekî tirs min ji leşker pirsî:  
— Xêr e, gelo ji bo çî ye?  
— Ez bi xwe nizanim, tenê komutan gote min »her banî Sîdar Beg bike«.  
— Baş e, here ez ê gaveke din werim. Min got.  
Gotin rehet bû, lê piştî çûyîna leşker, xwêdaneke cemidî ez girtim, dilê  
min çû û hat. Min pirtûka destê xwe danî, kursiya xwe bir hundir, qed-  
erekê li hundir rûniştim. Rojbîna min li dora min çû û hat, wê dixwest  
ko em weke her car ji xwe re bilizîn û heneka bikin, taqet bi min re nemabû. Min bi dilekî sar û tirseke mezin, kincên xwe yên paqij li xwe  
kir, ji mal derketim, çûme nexweşxanê, hinda hevala xwe, min ji wê re  
got: » Hava Komutan şandiye pê min divê ez herim, bê hela xêr e«.



Hevala min jî tirsiya, devê xwe vekir ko tişteki bêje, ez li bendê nesekinîm

û ketim rêya qerekolê.

Saet li dor sisiya bû, qerekol li aliyê din î nahiyê bû. Yanî nahiyê di or-

ta qerekolê û nexweşxanê de dima. Serê min di ber min de û bi gavên

hêdî hêdî dimeşiyam, min ne dixwest ko dawiya vê riyê bê. Bi wan xof û

xeyala, bi wê tirs û heyecanê ez ghiştim qerekolê.

Qerekol li cihekî bilind hatibû çêkirin, dora wê baxçe, rêya wê çêkirî bû. Di nava wê daristananê de, xaniyekî ji betonê avakiribûn, dora wê ji

kevirên reş, weke sûrekê hatibû çêkirin û ew kevirên reş, ji serî hetanî

nêvî, boyaxeke sipî kişandibûn ser. Bi xebata leşkeran, hewş, der û dora

qerekolê gelekî xweş bû bû, hewşeke mezin çêkiribûn. Di orta hewşê de

12

GARDIYAN

holikek ko ji dara mêwê hatibû pêçandin hebû, di bin holêkê de, masayek û şeş kursî hatibûn danîn. Ev cara yekem bû ko ez diçûm wir. Li

dor maseyê çend kesên bi kincên paqij û kravat rûniştî bûn. Dema ko

çavên min li wan ketin tirsî min zêdetir bû, çongên min ricifîn, min  
we-  
ha baweriya xwe anî ko wan ev hazirî ji bona min dane çêkirin ko  
îfada  
min bigirin û min bibin Diyarbekrê. Tirseke weha ez girtim ko bi zorê  
min xwe li ser piyan girt. Du kesên bi kravat û bi kincên xweşik yê  
di na-  
va wan da, gelekî bala min kişandibû hebûn. Yek ji wan simbêl zer  
bû.  
Dema çavên min li wî ketim ew kesên li işkencaxaneyê Diyarbekrê  
ko  
simbêlên wan zer bûn, hatin bîra min. Dinya li ber çavên min tarî bû  
û  
wê demê te kêr li min bixista xwîn ji min nedihat. Xwêdaneke sar ez  
gir-  
tim, min ne dixwest ko ez ber bi masayê herim. Xwestina min î wê  
demê  
ew bû ko erd veqelişîya û ez tê de wenda bibama. Tirsî min ne  
îşkence û  
lêdana wan bû, tirsî min ew bû ko ew derewa me kiribû, wê  
derketa û  
piştî wê derewê Hava û Rojbînê wê nikarîbana li wir jiyana xwe bi  
awayekî normal bidomandana. Tirsî ew bû ko ew ê cara dudiyan bi  
min  
re perîşan bibana. Eger em li Diyarbekirê bana xem tunebû, lê li vir,  
wê  
ji bona qîz û hevala min gelekî zehmet ba. Hîn ez di van xem û  
xeyalan

de bûm ko bi dengê komutan hatim ser heşê xwe ko ew dibê:

— Ooo Sîdar Beg! -Berê xwe bi wan kesên rûniştî vekir û domand.

Sîdar Beg ev e.

Komutan ji cihê xwe rabû hate pêşiya min destê xwe dirêjî min kir  
û

xêrhatineke germ da. Bi wê xêrhatina wî re ez hebekî hatim ser heşê  
xwe,

me destên xwe dan hev, min jî wî re got:

— Xêr e, komutan, te şandiye dû min?

Min dixwest ko beriya her tiştî rewşa xwe fêr bibim ko bê hela wî ji  
bo

çi şandiye dû min. Berî ko ew biaxife, destê me di destê hev de em  
bi

hevre nêzîkî masê bûn, ew kesên rûniştî rabûn, destê xwe dirêjî min  
kirin,

bi destdirêjkirina wan komutan axifî û em bi hev dan naskirin. Ê got:

— Sîdar Beg, ev herdu kes, hevwehatiyên te ne, ew ji bajarê Muşê  
ne. Ê

zîvirî ser wan û axaftina xwe domand. Sîdar ev e, ew bi xwe ji  
Mêrdînê ye.

Ez ji wê tirsê ko bême girtin xilas bû bûm, heşê min hate serê min,  
kê-

fa min hat, bi avîtina wê tirsê, bi awayekî kêfxweşî min halê wan,  
wan jî

halê min pirsîn. Ew herdu kes di fabrîka çayê de teknîsiyen bûn.  
Dema

me baş hevûdu nas kirin, kêfa min zêde, tirsê min kêm bû.

Komutan gazî leşkerekî kir, leşker hate ba me silaveke leşkerî da û got:

— Emir bike komutanê min.

13

GARDIYAN

Komutan zîvirî ser min û got:

— De ka bêje tê çi vexwe.

Min Coca Cola xwest, piştî wê tirs û sitresê vexwarina tiştê sar we gelekî baş ba.

Êdî bi awayekî bê tirs me dest bi sohbeta xwe kir, piştî vexwarina cola

yê leşkeran ji me re çayeke xweş jî çêkirin. Hîn me çaya xwe vedixwar, ko

du mezinên nahiyê jî li me bûne mêvan, komutan em bi hev dane nasandin. Sohbeta me her ko çû germtir û xweştir bû. Hatina wan herdu

kesên mezinên wê heremê ji bo min firseteke hîn baştir bû. Di dema so-

hbet û çay vexwarinê de, kesekî ji rûniştevanên wir yê nahiyê hat û ji

nobedarê leşker re got:

— Ez dixwazim komutan bibînim. Ji xwe me jî ew kes didît hema komutan gazî wî kir û got:

— Ka were hela te xêr e?

— Komutanê min beytarê me ji qezê hatiye vir û gote ko eger karê ko-

mutan tune be ez ê werim, çayeke wî vexwim.

Bi qedandina gotina wî, komutan gotê:

— Here bila zû were ji xwe va ye çend hevvelatîyê wî jî li vir in, firset

ev firset e, hemû hevwalatî li vir in.

Piştî qederekê beytar jî hat, min û wî cara yekem bû ko me hevûdu didît. Komutan em bi hev dan naskirin, kêfa me herduyan jî hat.

Piştî

xêrhatinê, min û wî hebekî sohbet kir. Ew bi xwe ji Ruhayê bû û kurdî jî

zanibû, demeke gelekî dûr û dirêj çê bû bû ko ez bi kurdî neaxifbûm. Wê

êvarê min dilê xwe rehet kir. Ji xwe komutan gelekî aciz bû bû ko dema

min û baytar, me bi kurdî qise kiribû. Lê komutan ew nerazîbûna xwe ya

wê rojê, piştî çend rojên din ji min re gotibû .

Me hemûyan bi hev re şeveke gelekî xweş û rind derbas kir. Hinek ke-

san gelek vexarin, ji xwe derbas bûn, hin li ser heşê xwe bûn. Komutan jî

ji ber axaftina min û baytar ya bi kurdî gelekî aciz bû bû, loma wî ew acizbûna xwe bi vexwarina wiskiyê dabû veşartin.

Qerekol di nava daran li ser girekî bû, hewşa wê weha çêkiribûn ko de-

ma mirov li wir rûnişta, hemû nahiye dihate dîtin. Bayekî hênik dihat, li

wî cihê hênik, sohbet û rûniştin gelekî xweş bû. Em bi hev re ketibûn so-

hbeteke gelekî xweş. Saet ber bi pêş diçû, di wê xweşiyê de min xwe  
ji bîr  
kiribû ko xeberekê bişînim mal da ko di hatina min î vir de tu tiştêkî  
bi  
tirs tune. Wê sohbeta me ya xweş û delal hetanî destê sibê  
domand,  
piştî qedandina çend şûşeyên wiskiyê, em ji hev belav bûn.

14

## GARDIYAN

Dema ez hatim malê, hevala min hîn ranezabû, ew bi tirs ko ez ê  
dîsa  
bême girtin li benda min sekînbû ko xeberekê bigire bê ka rewş  
çibû?  
Rebena hevala min ji tirs ko ew ê min dîsa wenda bike xew bi çavê  
wê  
neketibû. Hezkirineke wê î gelekî zêde ji min hebû. Wê her dem  
dixwest  
ko ez li ba wê bim û em bi hev re hesreta wan salên buhurî derxin.  
Qasî  
ko ji min hez dikir û ne dixwest ko min tucarî wenda bike, ewqasî jî  
dixwest ko ez karê xwe yê siyasî bidomînim. Ew tucarî têkilî nava  
karê  
min î siyasî nedibû, eger tiştêk ji destê wê bihata, wê jî qasî taqet û  
hêza  
xwe alîkariya min dikir.  
Roja din, li nahiyê hate belavkirin ko beytar jî hevwaletiyê min e.  
Her

ko çû rewşa min baştir dibû, qedr û qîmeta min zêdetir dibû. Li aliyê  
din

rewşa me ya ko ji kesî ve ne xwuya û, gelekî zor bû. pereyên me  
tunebûn,

gelek caran em hesrata nîv kilo goşt bûn ko em ji xwe re bikin şîv.  
Êvaran

dema ez ji qahwexanê vedigeriyam malê, Rojbîna min dihat pêşiya  
min

û digot:

— Bavo ka te ji min re çi anî. Weke her car dilê min dişewitî, kizinî ji  
nava min dihat, tenê min digot:

— Min îro ji bîr kir, ez ê sibê ji keça xwe ra bînim.

Rojbîna min ketibû sala sisiyan, wê hîn nizanîbû ko bê peretî çi ye û  
çi-

lo ye. Dema min ji wê re bigota ko pereyê min tune ne, wê dikarîbû  
ji

hinên din re bigota ko » Pereyên bavê min tune ne loma ji min re  
şekir

nakire« min bi vî awayî Rojbîna xwe gelek rojan dixapand. Ew her  
êvar li

benda min disekinî ko ez ji wê re tiştê xwarinê bikirim û bibim. Hin  
ro-

jan min jê re dikirî, lê wê jî her roj dixwest, ma di wê tunebûnê de  
kê

karîbû her roj tişt bikiriya.

15

GARDIYAN

II

Rojên xweş, dema tavê pencên xwe yên germ berra erdê dida, min Rojbîna xwe dişand nava zarokan ko ew ji xwe re bilîze. Û pirtûkek di-

girt, derdiketim derve û dest bi xwendina wê dikir. Bi vî awayî heta saet

dibû sisê, êdî min dev ji xwendinê berdida û berê xwe dida qahwexanê.

Ev hal bû bû weke karê min î rojane. Herkesekî baweriya xwe anîbûn ko

ez dersên xwe dixebitim, loma tu kes heta saet sisiyan bi ser min de nedî-

hat.

Nexweşxane li aliyê bajêr î hêla rastê, li ser girekî bilind hatibû çêkirin,

ji xwe hemû heraêma Derya Reş bi xwe tev gir û dar in. Cihê nexweşxanê

cihekî xewle bû, ew bi awayekî modern, hatibû çêkirin, cihê wê fireh, der

dora wê bi darên çamê hatibûn xemilandin. Riyên hemû gundên wê der

û dorê di ber wê re derbas dibûn. Ew kesên ko karê wan li bajêr tune ba,

ji xwe hewce nedikirin ko herin nava bajêr. Pêwîstiyên xwe li nexweşxanê

diqedandin û vedigeriyan gundên xwe.

Tiştê herî balkêş ew bû ko her roj di eynî dem û saetên serê sibandin de,



xortekî yanî kesekî temenê wî li dora 25-30 salan bû ko di ber  
nexweşxanê  
re derbas dibû, diçû ser wî girê li hemberî nexweşxanê û heta tarî  
diket  
erdê li wir dima û piştî ko tarî diket erdê bi şûn de vedigeriya. Piştî  
çen-  
daekî, êdî çûyin û hatina wî kesî bala min kişand ko ev mirov dihere  
û tê,  
ew ne weke kesên ji gund dihatin, ew mirovekî xemgîn bû, ji ber ko  
her  
dem serî wî di ber de silav li kesî nedikir, diçû û dihat, car carna wî  
li hêla  
mala me dinerî, weke bibêje »wele ez dixwazim werim hinda we, lê  
ez  
nikarim«. Ji roja ko em li wir bi cî û war bû bûn, rewşa wî ketibû ber  
çavên min. Ewilî ez li wî ketim şikê ko ew ji ber jinên ko li  
nexweşxanê  
kar dikin diçe û tê, lê kesên kar dikirin, weke hemşîre, jina min û  
weke  
dadûk hebû, lê ew jî bi karmendekî nexweşxanê re zewicî bû. Ez  
gelekî  
fikirîm ko gelo têkiliyên wî bi dadûkê re heye, an wî çav berra jina  
min da  
ye.  
Di demên ko tavê pencên xwe bera erdê dida, der û dora xwe germ  
dikir, min jî dixwest ko hesreta çend salên di girtîgehê de yên ko bê  
tav  
16

## GARDIYAN

mabûm derxim. Loma min kursiyek derdixist, pirtûkek jî dikir destê  
xwe

û di bin wê tava xweş û delal de dest bi xwendinê dikir. Îro jî taveke  
xweş

hebû, loma min haziriya xwe ya derve qedandibû û xwe li ser  
kursiya xwe

bi cih kir ko dest bi xwendinê bikim. Min rûpelên pirtûkê di ser  
hevde

dibir û dianî, qet sebra min ne dihat ko ez bixwînim. Lê dîna min dît  
ev

bû, ew ew kesê ko her roj di vir de derbas dibû, cixareyek xiste devê  
xwe

û ber bi min hat, dema ew li gel min rawestiya û got:

— Gelo agirê te heye ko ez cixara xwe pêxim.

Min çeqmaq derxist û min xwest ko ez bi xwe cixara wî pêxim, dema  
wî xwe bi alî min de daqûl kir û bi awayekî nizm got:

— Derdê ko ez têdeme gelekî giran e. Qasî ko min bihîstî ye, tu  
dibis-

tana rojnamavaniyê dixwînî, de ka were ez ji tere vî agirê ko ez di  
nav de

dişewitim bêjim.

— Tu di nav çî agirê de ye, xêr e?

— Agirê ko ez di nav de me kes pê nizane. Ez dixwazim vî agirê ko  
ez

şewitandime, her kesek pê bizanibe, daxwaza min ji te ew e ko tu  
guh-

dariya min bikî û tiştên ko ez ê bejim, weke ko ez dibêjim binivîsînî.

— Bila be, hema tu çi demê dixwazî, em dikarin dest pê bikin.

— De baş e, hema serê sibê piştî ko ez ji vir derbas bûm tu jî li dû min

were. Qelem û defterê ji bîr neke?

— Baş e, tu qet meraq neke. Û wî da rê û çû, piştî wî jî ez ketim ramanên bê binî, ramanên hûr û kûr, min gelek meraq fikir ko gelo ew ê

çi ji min re bêje. Gelo çima wî xwest ko tiştên xwe ji min re bêje.

Rojtira din piştî çûyina wî, min kursiya xwe xiste hundir, pirtûka xwe danî, berê xwe da nexweşxanê çûme ba hevala xwe û min ji wê re got:

— Wa Hava vaye ew mêrikê ko min do behsa wî ji te re kiribû çû, ez ê

jî piştî qederekê herim, tu li Rojbînê miqate be.

— Bila be tu qet xema nexwe, bi xêr here û bi xêr were.

Ez ketim rê û min berê xwe da girê li hemberî nexweşxaneyê. Min dît

ko ew kes li wir, li bin darê rûnişti ye û li benda min e. Wî xêrhatina min

kir, me berê hinek sohbet kir, berî ko em dest bi axaftina bikin, min xwest

ko fediya wî rabe, loma min berî wî dest pêkir û got

— De va ye ez hatim, tê ji min re çi bêjî. De fermo.

— Tu bi xêr hatî.

— Tu di nav xêrê de be.

— Qurban ez tu xêr mêrê naxwazim, gunehkariya min kiriye, bi tu xêrê nayê şûştin.

## GARDIYAN

Mebesta wî diyar bû, wî dixwest biaxife, tiştina ji min re bêje, min jî weke rojnamavanekî jî wî pirsî, ko em derbasî mijara ko ew dibêje, bib-

— Ma gelo dê û bavê te sax in?

— Belê.

— Hûn çend bira ne.

— Ma tê çi bike ko em çend biran ne? Ji bo wan ez û ji bona min ew qediyar ne. Niha dê û bavê min, min weke ewladekî nahesibîn.

Xwişk

û birayê min jî ji min direvin. Ew jî naxwazin bi min re qise bikin. Lê heqê wan heye. Ji ber ko min gelekî dilê wan hişt, min gelek tade û işkence da wan.

— Çima sebeb çi bû ko te tade da wan?

Piştî vê pirsar min, ew rawestiya, cixareyek pêxist, ew bi hêrs dikişand,

bû ofe ofa wî, rûyî wî sor û mor bû, kelogirî bû, xwest bigirî, lê tenê bi

çend hêsirên girover hêrsa xwe daxist. Rahişt darikê xwe serê xwe bera ber

wxe da û dest bi kolana erdê kir û got.

— Belê qurban ji xwe tiştê ko dixwazim ji te re bêjim ev e. Û dest pê kir

got:

“Ez ji gundekî der dora Derya Reş im. Li wir hatime dinyayê, xwezî ez nehatibama dinyayê ko min ew bobelatên di girtîgeha Diyarbêkrê de di-anî serê ew mirovên qenc nedîta. Wê gelek baştir ba ko min bikarîba uzrê xwe ji wan kesên ko min bi xwe gelek tade û îşkence bi wan kiriye bixwes-ta. Lê ez baş dizanim ko bi uzirxwestinê ew bobelatên ko me dianî serê wan kesan, ez ê nikaribim xwe ji wê berpirsiyariyê xelas bikim. Ne ko ez ditirsim û loma vê yekê dibêjim, tiştêkî ko ez jê bitirsim nemaye, ji ber ko min hemû hebûnên xwe wendakirine. Tiştêkî ko ez pê bigirim jî nemaye. Hele hele ji kuştinê qet natirsim». Di virde weke bêje, »biner ez ê ji te re her tiştî bêjim, tiştên ko wê bête serê min jî ez bi xwe nema jê ditirsim, tenê dixwazim ew tiştê ko di tariyê de mane, derxim rohnîyê«. Û axaftina xwe berdewam kir: »Ew kultura û zanabûna ko di girtîgehê de didan me weha bû, ko di-viyabû em ew kesên ko li wê girtîgeha bi nav û deng ya Diyarbêkirê gardiyan bûn, pêwîst bû ko me lêdan û tiştên nebaş bigotana ko çavên

mirovên li wir girtî bitirsanda. Ew kultura ko me li wir girtibû,  
bingehê

tiştê xerab û nebaşiyê bûn, ew kesên ko fêrî wê kulturê dibûn zû bi  
zû

nikarin xwe ji wê xerabiyê azad bikin. Eger tu li min guhdarî bike, ez  
ê

18

## GARDIYAN

van ji te re yeko yeko şirove bikim ko ew tiştên me gardiyanên  
girtîgeha

Diyarbekrê dikir, in rêz bikim ko sedemên wê lêdanê ji ko dihatin  
bêjim

ko bila herkes bizanibin ko em, ew gardiyanên wira ne bi destên  
xwe bûn.

Weke min berê jî anî zimên ko ez li gundekî derdora Derya Reş  
hatime

dinyayê. Malbata min ne malbateke dewelemend û ne jî feqîr bûn,  
îdare

me ya rojane bi awakî normal derbas dibû. Em sê kur û çar qîzên  
malê

bûn. Yê mezin ez bûm. Ji ber ko ez ê mezin bûm, di dema min de  
hîn li

gundê me dibistan nehatibû çêkirin, ew kesên bixwestana biçûna  
dibis-

tanê, pêwîst bû ko biçûna gundekî din xwendina xwe ya ewilî li wir  
biki-

rina û dûre rewşa aboriya malbata wan kesan dest bida, malbata  
wan li  
bajêr odayek ji wan re kirê dikirin û wî/wê li wir xwendina xwe dido-  
mandin.  
Ji bo min yek ji vana derbas nedibû. Ne malbata min dikarîbûn min  
li  
bajêr bidin xwendin û ne jî ez karîbûm biçûma gundekî din. Ji ber  
ko  
karkerê mala me tenê ez bûm, dema ko ez jî biçûma xwendinê  
kesekî ko  
alîkariya bavê min bikra nedima. Loma bavê min ez neşandim  
dibistanê  
û ez li ba wî weke karker xebitîm. Me bi hev re debara malê dikir.  
Ew xebata me bi hindikayî ba jî debara me dikir.. Ji ber ko ez êdî bû  
bûm xebatkarê malê, min êdî alîkariya aboriya malê dikir, loma  
mafê  
min î biryardayîne di mala me de hebû. Bavê min êdî guhdariya min  
dikir. Min jî xwest ez vî mafê xwe ji bona xwişk û birayên xwe bi kar  
bîn-  
im. Loma min xwest ko ew herin dibistanê, dema min ev nerîna xwe  
ji  
bavê xwe re got, bavê min ewilî li dij derket û got: »biner kurê min,  
em  
ne ewqas dewlemend in, em ê nikaribin wan bidin xwendinê,  
çûyina  
dibistanê mesref ji re divê, pere ji re divê, li bajêr xanî kirêkirin jê re  
divê,

di bin van mesrafan de em ê herin xwarê, ka bihêle bila ew jî bi me re kar

bikin, wê rewşa me baştir bibe«. Min ev mazerata bavê xwe qebûl nekir û

min ji wî re got: »Bavo ez her tiştê wan didim ser xwe, ez ê hîn zêde kar

bikim, ez nahêlim ko ew li me bibin serbar, bi xebata xwe ya zêde, ez ê

mesrefên wan derînim. Tenê tu bêje erê, yên din hemû ez diqedînim.«

Min bavê xwe razî kir, ew hebekî nerm bû û got: »Baş e, kurê min tu

dizane, lê rojekê em têkevin tengasiyê, ez ê vê bînim bîra te«. Dema mes-

refên xwişk û birayên min yên dibistanê kete hustiyê min, êdî rehetbûn

ji min re nema bû, barê min gelekî giran bû bû, lê çî dibe bila bibe, daxwaza min ew bû ko ez ê wan bidime xwendinê, loma jî min hîn bêtir

dest bi xebatê kir, êdî ne şev û ne jî rojên min hebûn. Hema hema mirov

dikare bêje ko ez bi şev û roj dixebitîm, bi vê xebata zêde ez ketim sala bîs-

19

GARDIYAN

tan. Temenê min bû bû bîst, berpirsiyariya min girantir bû bû, ji ber ko



bi saya wê xebata min, xwişk û birayên min li bajêr xwendina xwe dido-  
mandin, min nedihîşt ko ew hewcedarî tişteki bi bin. Lê temenê min bû  
bîst, divê êdî ez biçûyama leşkeriyê, leşkerî jî weke deynekî dewletê li  
mirovan e..  
Dema behsa leşkeriyê dibû, ez bi xwe gelekî ditirsiyam, ji ber ko ne xwendin û ne jî nivîsandina min hebû. Yanî ji min re cahil dihate gotinê,  
ez cahilê xwedê, ez ê li leşkeriyê çî bikim, di nava hevalan de rojên min ê  
çawan derbas bibana! Ma gelo ez tenê vêya difikirîm, na, na, ne tenê ev  
bû, derdê herî giran pere bû. Di serê min de her gav ev derbas dibû ko  
»gelo dema ez herim leşkeriyê kî yê ji min re perayan bişîne? Ez ê çawa de-  
bara xwe bikim, di nava heval û hogiran da ez ê çî bikim.« Xebata bavê  
min ancax têrî mesrefa xwişk û birayên min û malê bikira. Ji xwe wî her-  
car ji min re digot: »Te nehişt ko ev zarona ji me re kar bikin, te ew şandin  
dibistanê, ji ber vê yekê ye ko rewşa me ya aborî nebaş e. Eger wan jî weke  
min û te kar kiribana wê niha tu pêwîstiyên me tuneba. De here leşkeriyê,

lê ez ê nikarim te li wir bi awayekî qenc xwedî bikim, tiştê ko ji destê min

bê, ez ê ji te re bişînim, divê tu jî îdara xwe li gor pereyên xwe bike«  
Roj di ser rojan re derbas dibûn, roja leşkeriya min hat û weke hemû heval û hogirên xwe min jî xatir ji dê, bav, xwişk û birayên xwe xwest.

Ketim rê. Min berê xwe da wî bajarê ko cara yekem bû ko min navê wî

dibihîst. Dema min navê wî bajarî bîhist tirsê ez girtim, lertzîn kete nava

min, çûyina wir ji mirinê xerabtir bû, lê êdî veeger tune bû, hêsirên diya

min weke xulorîkên baranê di ser hinarikên rûyê wê de dihatin xwarê.,

Bavê min car-carna bi wê re dixeyîdî û car-carna jî ji min re digot:

— Kurê min leşkerî deynê zilaman e, ew kesê ko leşkeriyê neke ne zil-

am e, tu guh nede diya xwe, ew ji ehmaqiya xwe digirî.

Her çiqas bavê min dixwest moral bide min jî alîkarî nedikir, min berê

xwe da wî bajarê biyanî û nava wan mirovên li wir dijiyan ko digotin »ew

kesên ko li wir dijîn ne weke merivan in, ew dikarin mirovan bixwin, we-

hş in, hov in û hew«. Dema wahşbûn û hovbûna wan dikete bîra min,

xwêdaneke cemidî ez digirtim. Nigê min dirincifîn, ji tirsê wan kesên hov

û wahş taya sar dihate min.

Bi gazîkirina haparlorê ez hatim ser heşê xwe ko êdî otobusa me dike

here, cara dawî min herkes dîsa maçî kir, te digot qey ez dikim herim û

venegerim. Ez bi xwe ketim rewşeke wer, ko min digot qey ez diherim

mirinê, ez diherim riya çûyinê û nehatinê. Ez wer bawer dikim ko bavê

20

GARDIYAN

min ev rewşa min famkiribû loma got:

— Kurê min dema te xwe gîhand cihê xwe hema zû bi zû ji me re xe-

berekê bişîne ko em bizanibin te xwe gîhandiye cihê xwe. Dûre xwedê

mezin e, qet xema mexwe, du sal wê weke avê derbas bin. Hew dîna ko

te dît qediya.

Axaftina bavê min ya dawî weke zengilekî di guhên min de lêxist, »xe-

ma mexwe, du sal wê weke avê derbas bin«. Min jî dixwest du sal weke

avê derbas bin, min dixwest ko ez ji vê gotaina bavê xwe bawer bikim, lê

bawerîkirin zehmet bû. Ji ber ko li Diyarbêkrê ne du sal, du roj jî derbas

nabe, di nava wan hovan de, ma gelo wê dem çawan derbas biba.  
Bi vê  
bêhêvîtiyê min xatir ji wan xwest, li otobusa xwe siwar bûm, di  
ramanên  
kûr û hûr de min dinya xwe wenda kir. Otobus dihere an sekiniye  
min  
nema zanîbû, tenê dema deng bi miawîn ket, digot:  
— Em ê 30 deqîqan li vir rawestin û çay ji kîsê şîrketê ye.  
Bi wî dengê ko ji hoperlorê derket, hatim ser hişê xwe, min çavên  
xwe  
vekirin, çûme avrêjê; dûre min rûyê xwe şûşt, li dora xwe mezê kir  
ko ev  
cih, cihekî biyanî ye. Dinya tarî bû bû, ji tarîbûna dinyayê, têgihîştim  
ko  
em gelekî hatin e. Her kesekî pêwîstiyên xwe pêk dianîn, hina limêj  
dikirin, hina xwarin dixwarin, hina çay û vedixwar in, ez bi xwe birçî  
bûm, cûze cûza zikê min bû, lê ji derd û qehra, min nikarîbû tişteki  
têxime ber dilê xwe, zikê min vala bû, lê madê min tişteki nedigirt.  
Ji dil-  
va xwarinê min jî weke hin kesên diçûn camiyê, misînek girt destê  
xwe,  
bi awayekî nîvco destlimêj girt, destlimêj çawan dihat girtin, min bi  
xwe  
baş nizanîbû. Ji ber ko heta wê rojê min qet limêj nekiribû. Min li  
der do-  
ra xwe nihêrt ko bê ka kesên din çawa ndestlimêj digrin û li mêj  
dikin ko

ez jî weke wan bikim. Hemûyan xwe xwar dikirin û rast dikirin, dûre  
bi  
eniyan diçûn erdê, di devê xwe de tişt digotin, lê çi digotin min ew  
jî  
nizanî bû. Berî ko hinek bi halê min î şaşo maşo bihesin min, weke  
wan  
kir û tenê min jî digot:  
— Xwedêyo! tu min ji vê belayê xelas bike. Ez ê di nava wan wahşan  
de  
çi bikim, ez ê çawan du salan biqedîninm Yarebî, xwedêyo tu li min  
were  
rehmê! Amîn.

Bi vî awayî ta ko dengê haporlorê kete guhê min qêrînî jê dihat û  
dig-  
ot:

— Otobusa »Ulusoy« ya ji Trabzonê hatiye û dike here Diyarbêkrê,  
di  
hereketê de ye, bila rêwiyên otobusê swar bin, otobus di hereketê  
de ye.

Oxira we ya xêrê be.

21

GARDIYAN

Min êdî dev ji limêja xwe berda, bi bazdan hatim li cihê xwe rûnştîm,  
dîsa ketim xem û xeyalan.

Diyar bû ko kêfa şofêrê me li cih bû, zikê xwe dagirtibû, çay û cixara  
xwe vexwaribû, kasetek xiste teypa otobusê, dengê muzîkê li  
otobusê

belav dibû, te digot qey dengbêj bi halê min dizane û ew li ser min dibê-

je, wî bi awayekî xweş û rind, derdê ko ez di nav de bûm dianî zimên».

22

GARDIYAN

III

»Saet çarê sibê bû ko me xwe gîhand bajarê Diyarbêkrê. Berê min li der

û dora xwe mêze kir ko bê hêla şikeftên ko ew tê de dijîn çawa ne. Ji ber

ko li hêla me digotin: »Ew kesên li wê hereêmê dijîn di şikeftan de ne.«

Min ev yeka weha dizanî bû. Lê dema ko min li dora xwe temaşe kir,

gelek qesrên bilind ketin ber çavên min, ewilî min bawer nekir ko ev ba-

jar Diyarbekir e, loma min ji yekî pirsî:

— Pismam , ma gelo ev ko der e.

Bersîva wî ew bû:

— Diyarbekir e, Diyarbekir. Qey tu şaş ji otubusa xwe daketiye.

— Na, na.

Bi rastî ez şaş û matmayî mabûm. Min bi xwe re qise kir ko gelo çima li hêla me digotin: »Kesên vir ne xaniyên wan hene û ne jî ew weke mirovan e. Niha dinêrim ko qesrên li vir ji yên hêla me bêtir in, bilintir

in û xweşiktir in. Mirovên vir jî weke kesên hêla me ne. Ê mirov dikare

bêje ko lixwekirina wan, ji yê hêla me xweştir û temiztir in«. Bû niçe

niça min, ji ber niçe niça min yek li min haybû ko ez dikim niçe niçe, nêzîkî min bû got:

— Pismam ma te tiştê xwe wendekiriye?

— Na, na. Min got.

Gelo çima ev derawa hanê li hêla me hatibû bi cih kirin. Gelo ji bo çî,

li hêla me di derheqên mirovên vir de weha dihate fikirandin û gotin!

Min tu mane neda vê yekê û ji ber ko zêde wexta min tune bû, ez nikarîbûm dûr û dirêj bifikiriyama, tenê karim bêjim ko dema çavên min

li wan qesran û mirovên li vir ketim, hinek ken bi rûyê min ket, kêfa min

hat ko ew tiştên ji min re hatibûn gotin ne rast in. Lê di navbera van du

salên min î leşkeriyê de, wê çî bihata pêşiya min, hîn ne diyar bû, ma kî

dizane ko li leşkeriyê wê çî bê pêşya mirovan. Tenê mirov dikare bêje ko

dema kesek dihere leşkeriyê ew kes heta taliya temenê xwe serpêhatiyên

leşkeriyê dibêjin, lê dîsa naqedînin.

Ez jî weke her rêwiyekî çûme ber otobusê ko çentê xwe ji bagajê bigir-

im, dema ko mawîn çente derxist û berî ko ez çentê xwe bigrim  
destê

xwe, wê demêmin bala xwe dayê ko çend kes li dor min civiyan, her  
yekî

xwe dirêê çente dikirin, yekî digot:

— Kekê ez ê çentê te erzantir bighînim, cihê ko tê herê. Yê din digot:

— Na ez dikarim hîn erzantir bibim.

Min bi xwe tu tişt ji wan famnekir ko çima ew weha dikin, dûre lê  
hay-

bûm ko ew kesên weha bi pereyan, yanî bi heq tiştê mirovan  
hildigrin, bi

hilgirtina wan çenteyan û alavan ew ji xwe re çend quruş pere  
qezenc

dikin. Ji ber ko pereyan min zêde tunebûn, min çenteyê xwe hilgirt  
û ji

mawînê otobusê re got:

— Gelo ez ê çawa herim Kurtoglu?

Kurtoglu cihê mîn î ecemîtiyê bû. Ew kaxiza adresa min li ser dirêjî  
mawîn kir, wî çûyina wir ji min re got, ez li minîbûsê siwar bûm û  
çûme

cihê xwe, cihê tadê û îşkencê, cihê ko mirovan weke heywanan jî  
nahesi-

bînin«.

Dema ew bêjeya navê Kurtoglu ji devî wî derket, bi yek carê rûyê wî  
hate



guherandin, qederekê sekînî, cixareyek vêxist, devê xwe vekir ko tiştina

bêje, lê tu tiştêk negot, tenê hilmên bê binî li cixara xwe dixist. Li çavên

min mizekir got:

— Kurdoglu, Kurtoglu, ma derdê wir, tade û cefayê di wir de dihat kirin ne kêmi ya girtîgehê bûn. Di wir de mirov hatin şewitandin, di wir

de gelek kes hatin kuştin, û gelek kes hatin seqetkirin. Ax ax, ez nema

dizanim ko behsa kîderê bikim.

Piştî hilmvedanekê wî dîsa domand.

“Êdî rojên min î leşkeriyê destpêkiribûn, weke her kesekî min jî kincên

leşkeriyê li xwe kiribûn. Porê xwe bi makîna poran ya 3 nimre kur kiri bû

û di nava wan kincan de bû bûm mirovekî din. Gelek kesan dema kincên

leşkeriyê li xwe dikirin, ew kinc li bejna wan dihat, lê yên min te digot

qey, kinc jî ji min ne xweş bûn, qet li min nehatibûm, ez di nava wan de

bû bûm mirovekî din. Heroj piştî xwarina serê sibê me dest bi talîma leşkeriyê dikir, lêdan û îşkenceyeke gelek zor jî didît. Ji xwe ew kesê ko

leşkeriyê bike û lêdanê nexwin tune ye. Mirovên ko wan bobeletan dibînin, dixwazin bimrin ko leşkeriyê nekin. Ez jî ji wan yek bûm, ne

xwendina min û ne jî nivîsandina min hebû, ji ber ko ez li gund mezin bû

bûm, min lêdaneke baş dixwar, ji xwe navê min jî cahîl bû.

Di bin darê zorê de û bi hukmê lêdanê, leşkerî dihate kirin, qasî 15-20

24

GARDIYAN

rojên min li wir bû bû ko êdî talîma me di bin kontrola yuzbaşiyekî de di-

hat çêkirin, her roj ew yuzbaşî dihat û li me temaşê dikir, car carna jî di-

hat nava me, hal û xatirê me dipirsî. Navê bajarê ko em jê dihatin fêr

dibû, bi leşkeran re qise dikir. Rojekê hate ba min û pirsî:

— Tu ji kîjan bajarî hatiye?

— Trabzonê komutanê min.

— Trabzonê ha, got û serê xwe hejand, ez hebekî tirsiyam, gelo ji bo çi

wî serê xwe hejand, »Naxwe Trabzonê got«, li min mezê kir bi awayekî

nerm û xweş berdewam kir- Trabzon gelekî xweş e, mirovên wê jî gelekî

baş û welatperwer in. Ma ne weha ye.

— Belê komutanê min.

— De baş e, baş, ez ê qîmeta te bizanibim. Dûre destê xwe di serê min

da, bi awayekî dilpak û rehm li min nerî, û got:

— Tu qet netirse, tu min guhdarî bike, tê li vir bi awakî gelekî qenc leşkeriya xwe biqedîne. Ez ji Trabzoniyan hez dikim, ez wan nas dikim.

Ew berjewendiya welatê xwe di ser hertiştî re digrin. Ma ne weha ye?

— Belê komutanê min.

— Aferim kurê min, eger tu li min guhdarî bikî tê qet poşman nebî. Keniya, da rê û çû.

Axaftin û qilafetê wî yê wê demê, hîn jî weke niha li ber çavên min e.

Piştî wê roja ko ew li gel min axifbû, dikarim bêjim ko êdî ew her roj di

dema talîmê de dihate hinda min, bi min re qise dikir, gelekî kêfa min jî

dihat ko »xwedê dua min qebûl kir û ev mirov ji min re şandiye«.

Êvaran

dema xwarinê û berî razanê, hevalên min digot:

— Kuro ew yuzbaşî çî yê te, weha nêzîkayê li te dike, te ev bertîl çawan

çêkiriye, de ka alîkariya me jî bike...

— Wele ez nizanim, tenê wî ji min re digot ko »ez ji Trabzoniyan hez dikim, hemû jî welatperwer in«.

25

GARDIYAN

IV

»Bi çûyin û hatina yuzbaşî, nava me germ bû bû, kêfa min li cih bû, ji ber

ko riya xelasiyê dihat dîtin. Berî ko ez werim leşkeriyê, kesên leşkerî kiribûn digotin: »Li leşkeriyê nasekî meriv di nava serbazan de derkeve,  
wê demê kêf kêfa meriv e.« Loma kêfa min jî gelekî ji wî yuzbaşiyê re hat-  
ibû. Ma min ji ko dizanîbû ko ew kes sadîst e, ma min ji ko dizanîbû ko  
ew kes, kêş e û min ji ko dizanîbû ko ew dijminê mirovên qenc e, ma min  
ji ko dizanîbû ko wê bobelatên mezin bîne serê min. Mehek bi ser ecemîtiya min de derbas bû bû. Ew meh li min bû bû weke çend salekê,  
ji lêdanê mirov ber xwe nedidît. Heroj lêdan tada û zulmdarî hebû, ji ber  
wê zulm û zordariyê merîv digot: »Bila mirov ji vir xilas be, çi dibe bila  
bibe«. Rojekê dîsa em li talîmê bûn, ko ew yuzbaşiyê min, ew kesê li gor  
gotina hevalan, ko mirovê ji alî min de hetiyê bertîlkin, loma weha li  
min xwedî derdikev e, ew kesê ko min jê hêvî dikir ko ew ê min ji vê zul-  
mdariyê azad bike hat Em hemû leşker di rizê de bûn Wî destê xwe xistibû nav hev û danîbû ser qûna xwe, serê xwe bilind kiribû, li me mêze  
dikir, wî ji nava me çend kes destnîşan kir. Ez jî yek ji wan bûm. Kêfa min

hat ko ez jî hatibûm hilbijartin, em ew kesên ko hatibûn destnîşankirin

me weha bawer dikir ko ew ê me ji vê ecemîtiyê xelas bike û weha bû, em

ji ecemîtiyê hatibûn azadkirin. Lê berê me ber bi ko de bû, ne diyar bû.

Dema ko em ji nava hevalên xwe derketin, Yuzbaşî got:

— Bidin dû min. Me hemûya bi hev re got:

— Emir bike komutanê me.

Em li erebeyake servekirî kirin, çûne cihekî din yê leşkeriyê, em birin metbexê berê xwarin da me, xwarin gelekî xweş bû, em weha tê gihiştin

ko ev xwarin taybetîji bona me hatibû çêkirin. Em şaş bû bûn, gelo çima

ev kes weha dike, gelo ji bo çî em ji ecemîtiyê azad kirin, xwarina xweş

dide me. Me xwarina xwe qedand. Piştî xwarin û vexwarinê wî pirsî:

— Çawa bû? we têr xwar û vexwar, ma hûn dixwazin her roj weha bixwin, vexwin û talîmê nekin. Me dîsa bi hev re got:

— Tu emir bike komutanê me.

26

GARDIYAN

Hêviya min hatibû cih, ez difikirîm ko ev kes ji min re bû weke bavekî,

ma min ê ji ko bizanîba ko ev kes wê malikê li min xera bike... Wê dema

ko me ta`de û işkence dikirin em li xwe hay nedibûn. Lê niha dema,  
ez  
wan kiryanan difikirim, dîn û har dibim. Gelekî mixabin êdî tiştekan  
nema  
ji destê min tê. Tu bala xwe bide vî halê min, êdî ez nikarim herim  
nava  
civatê, dema li mirova mêze dikim ew kiryarên girtîgehê weke filmê  
sine-  
mayê têne ber çavên min û ji xwe fedî û şerm dikim».   
Min xwest ji wî pirs bikim, ko çima ew ketiye vê rewşê û min got:  
— Baş e, ez dixwazim fêr bibim ko çima tu nikare here nava civatê,  
se-  
beb çi ye? Sebeb çi ye ko tu dixwazî tenê li vê çolê di nava vê  
daristanê de  
bijî? Em bêjin tu ji civatê aciz e, lê çima tu naçe nava malbata xwe,  
najî?  
“-Ez bêjim qurban, ez bêjim. Dema leşkeriya min qediya, ez ji  
mirovantiyê derketibûm, bû bûm hov, bû bûm dewar, dîn û har bû  
bûm. Bû bûm weke seyekî har, ko min li kîderê mirovek bidîta hema  
min êrîşî wî dikir, ew kiryarên ko min li girtîgehê de dianî serê wan  
gir-  
tîyan, êdî di ruhiyeta min de, di serê min de hatibû bi cihkirin, ji bêyî  
wan  
tebata min nedihat, min dikir û nedikir min nikarîbû, xwe ji wan ser-  
boriyan xilas bikim. Min êdî mala xwe jî weke girtîgehekî dizanîbû,  
loma  
car carna dema ko bavê min tiştekan ne li gor min bikira, min ew weke  
ko

wî şaşitiyek kiribe, jê re digot:

— Kurê min te ev şaş kir, heqê te 20 jop e, ji ber şaşitî û çewtîtiyên xwişk û birayên xwe, yên ne li gor min, min lêdaneke weke ya girtîgehê li

wan fikir, kesekî nema diwêrbû bi min re qise bike, kesê ko bixwesta ji

min re tiştêkî bêjin an qise bikin, diviya bû ko bi awakî nîzamî biaxifiyana. Ew kesê ko bihata hemberî min û nîzamî nesekiniyana, lêdan dixwarin, ji bo vê yekê rehetiya malbata min ji destê min nema bû, ji

bona van kiryarên min, wan çend caran li min jî dan, ez çend rojan girê-

dam, tu fêde nedîtin. Eynî rewş ji bona kesên gundiyên me jî derbas dibû, kesê ko bihata ba min û qise bikirana min ji wî re jî digot:

— Kurê min divê tu nîzamî raweste û bi dengekî berz qise bike. Bi kur-

tasî li girtîgehê min çî fikir, ew tişt dixwest li wir, li gundê xwe, di nav

malbata xwe de jî bikim. Ji ber vê yekê, gelek caran şer di navbera min û

gundiyan de derdiket, min li herkesî dida, dûre gundiyan navê dînbûnê

bi dû min xistin, herkesî digot:

— Ev reben çû leşkeriyê dîn bû û hat, wax, wax wê çawa be.

Loma kesî êdî têkiliyên xwe bi min nedianîn, bi min re qise nedikirin, kesê qise bikirana jî lêdana xwe ji alî min de dixwarin. Her kesekî ez dîn

## GARDIYAN

dizanîbûm, bi tena xwe mam, weke kesekî dîn û beradayî. Piştî çendaekî  
li xwe hay bûm, lê êdî ev têgihîştina min pere nekir, ne mirovên min  
û ne  
jî gundiyên me tu kesekî têkiliyên xwe ji min neanîn, ez bûm dînekî  
gund, nav û dengê min weha li nahiyê hate belavkirin, êdî zarokan  
jî  
berra dû min didan, tînazê xwe bi min dikirin. Lê ez bi xwe ne dîn  
im,  
heşê min li serê min e, tenê car carna ew bûyerin ko min li girtîgehê  
kiribûn, bi awayekî derî îrade xwe, min dianî serê, dê, bav, xwişk û  
bi-  
rayên xwe û carna jî dianî serê gundiyan. Dema ez li xwe hay dibûm  
ko  
ev tişt ne rast e, ji bo ko ez carake din nekevim rewşeke weha min  
gelekî  
hewl dida, lê gelekî mixabin, tu fêda wê nehat dîtin. Ew jîyan û ew  
bûy-  
erên girtîgehê weke nîkotînê ketibû canê min, kesekî fêrî nîkotînê  
bibe,  
ew weha rehet, rehet, nikare xwe ji wê azad bike. Di gelek şevan de  
dema  
ez şiyar dibûm, radibûm ser xwe diçûm ber deriyê oda ko bav û diya  
xwe  
an jî ya xwişk û birayên xwe ya ew lê razayî bûn, dinerî û carna jî ez  
li



bendê dipam ko yek were komûtê bide min, eger kes nehata, min  
gazî

dikir:

— Êlan nobedar, qawîş, ma hûn li ko ne?

Di vê dengdan û gazîkirina min de hemû kesên mala me şiyar dibûn,  
dihatin ba min û gelek caran wan lêdan jî dixwarin«.

Li vir min nexwest ko ew zêde behsa tiştên malbatî bike, loma min,  
ji

vî pirsî û got:

— De baş em ê dawiyê werin ser van tiştan. Piştî wê xwarina xweş,  
yuzbaşî çî ji we kir?

— Ji xwe ya girîng ev e.. Li wir, yanî li metbexê, piştî xwarin û  
vexwar-

inê, yuzbaşî em xistin rêze û dest bi axaftinê kir:

— Binerin hevalno, weke ji we jî diyar e ko di leşkeriyê de tiştê herî  
zor,

dema ecemîtiyê ye. Mirovê ko li ecemîtiyê lêdanê nexwin tune ne.

Kesên

nobedarî negire tune ne. Ev tişt dibe qismetê herkesekî ecemîtiye  
dikin.

Ev çend rojên ko ez di dema talîmê de di derheqa we de ez bi gelek  
tiştan

hesiyam; bajarê ko hûn jê ne, fêr bûm, rewşa we û yên malbatên  
we bi her

awayî dinasim. Ji ber vê yekê ye ko min hûn hîlbijartin. Eger hûn li  
min

guhdarî bikin, tiştên ko ez dixwazim hûn pêk binin, hûn ê heta taliya

temenê xwe bi awayekî şad bijîn. Tiştên ko ez dixwazim ne ji bona  
şexsê  
min e. Ji bo hebûna dînê me î îslamê û welatê me î delal e. Ji bona  
van  
herdu tiştan divê mirov karibe her fedekariyê bike. Ji ber ko kesek  
nikare  
bê dîn û bê welat bijî.

Weke hûn jî dizanin ko di van salên dawîn de gelek kesên kominîst,  
28

## GARDIYAN

anarşîst, dînsiz û kurtçî dixwazin welatê me û ew dînê me î muqades  
ji  
dest me bigrin. Ma hûn dizanin ko komunîst çî dixwazin. Me  
hemûya bi  
hev re got:  
— Na, komutanê mîn.  
— Baş e, ez vê yekê jî ji were behs bikim, baş guhê xwe bidim min.  
Komunîst ew kesê ko ji bo wî, dê, bav, xwişk û bira yek e, ferq di  
nava  
jin, dayik û xwişkê de tune ye. Yanî her kesî komunîst dikare bi diya  
xwe  
re, bi xwişka xwe re razê, ev ne eyb e û ne jî şerm e. Ew kesê anarşîst  
jî  
dixwazin hema kuştinê bikin û bêtirîn ew ji kuştina leşker û polîsan  
hez  
dikin. Aha hûn di tv.:yê de dibînin û dibihîzîn ko roja leşker û polîsên  
me

nayên kuştin tune ye. Ji bilî vana yên herî xeter, bi zerar û tehlûke  
ne, ew  
kesên ji wan re dibêjin Kurd. Ew dixwazin vî welatê me perçe bikin,  
bi  
alîkariya dijminên me yên gawir, bi navê Kurd dixwazin welat perçe  
bikin, de werin vê ecêbê, dema ko ew welat jî perçe bikin, ew kesên  
li hêla  
wan bimînin, ew ê hemûyan bikujin, wê wan kesan bi saxî  
serjêbikin. Ew  
him anarşist, him konunîst û him jî kurtçi ne. Ji bona welatê me î  
xweş û  
delal, van kesên Kurtçî tehlûkeyên herî mezin in. Ew kesên vî karî  
dikin,  
an didin kirin, me gelek ji wan, girtine û xistine girtîgeha Diyarbêkrê.  
Divê ew bêne terbiyekirin, divê serê wan ji wan fikrên çewt bête  
paqîşkirin, divê em bi hev re wan bikin ewladên baş û qenc ji bo  
welatê  
xwe î şêrîn. Piraniya wan xwendavan in, ew dikarin zû bi zû mirova  
bixapînin, weke hûn dizanin ko serokên wan, rêberên wan bi xwe li  
Ewropa dijîn, pereyên wan pir in, jiyana wan gelekî xweş e. Me hin  
ji wan  
berpirsiyar û serokên wan jî girtine, hin ji serokên wan li vir in, li ba  
me  
ne. Ji bo ko em wan bikin mirov, pêwîstiya min ji gelek mirovên çak  
û  
pak heye. Min weha baweriya xwe anî ko hûn jî wan kesên ko mirov  
bikaribe pişta xwe bidin wan nin. Eger hûn rê nedin, wan komunîst,

kurtçî û dînsizan, em ê bi hev re welatê xwe ji van mîkroban azad bikin.

Eger em bi hev re van kesên weha bi tehlûke bînin rê, hûn ê hemû ji bo

vê yekê, ji ber welatperweriyên xwe, diyarî bigirin. Hûn ê bi her awayî di

girtîgehê de serbest bin, xwarin û vexwarina we, wê ji kîsê dewletê be û

xwarina we wê ya herî xweş û delal be. Hûn ê bi her awayî serbest bin, ke-

sekê ne li ser û ne jî li ber we bin. Hûn ê him qomûtanê xwe û him jî yên

girtiyan bin. Meziniya vê girtîgehê hûnê bikin. Di berpirsiyariya karê xwe de hûn ê ji min jî mezintir bin. Dema min jî sûc û guneh kir, li min

jî bixin. Nobedariya derve wê ji bo we tune be, çî gavê hûn bixwazin hûnê bikaribin, razên, rûnên, bixwin û vexwin. Her yek ji we wê bibe,

29

GARDIYAN

qomûtanê kowûşeke girtiyan, kowûş wê di emirê we de be, emirê xwe

hûnê bi xwe bidin. Kesên li we guhdarî nekin, hûn çî bîne serê wan hûn

ê bi xwe biryar bidin û di biryara xwe de hûn ê serbest bin. Tenê ez ê ji we

daxwazekê bikim û ew daxwaza min ê ev be, ko hûn bi awakî dilsoz  
wan  
kesên di vir de, yê bê dîn û îman, kurtçî û anarşîst, xwedê nenas û  
kurtçiyên bînin rê. Kesê ko zû bi ser keve, ez ê hîn zêdetir, mafê  
îstirehetê  
bidim wî. Lê ew kesê ko vê daxwaza min pêk nîne, ew ê vegere cihê  
xwe,  
veger jî, wê ne weha rehet be, di vegerê de serbazê ji we bipirsin:  
»çima  
hûn bi şûnde vegeriyân« hûn ê nikaribin tu bersivan bidin, ji bo ko  
we  
karê xwe yê welatparêzî pêk neaniye, li wir him hûn ê lêdanê  
bixwin û  
him karê herî zor wê ji bo we bête dayîn. De êdî her tişt wê li gor  
daxwaz  
û biryara we bête dayîn.  
Yuzbaşiyê me axaftina xwe qedand, wî him em tehdît dikirin û him  
jî  
nesîhatên xwe li me dikirin. Ji xwe tişteki ko me bigota tunebû. Hin  
kes  
bi zanabûna ko ew ê li komûnist û kurtçiya bixin hatibûn, hin jî weke  
min ji ber feqîriya xwe û bê peretî û nezaniya xwe hatibûn. Nav û  
paş-  
navên me hate lêkirin, tu kesekî ji me tu tişt negot. Navên weha li  
me  
kirin ko tu kes me nasneke. Navên me yê rastî nizanibin ko dûre  
tu

talûke neyê serê me. Kêfa yuzbaşî li cih bû, li gor wî her tişt qediya  
bû, lo-  
ma em li erebeyekê siwar kirin û berê me da wê girtîgeha bi nav û  
deng  
ya li bajarê Diyarbekrê, ya ji bona kurtçiya hatibû, çêkirin».

30

GARDIYAN

V

»Ew girtîgeha bi nav û deng ya bi navê 5 noluyê li ser rêya Sêwregê  
û li  
navça Baxlara de hatibû damezradin. Ew bi awayekî gelek modern  
hati-  
bû çêkirin, modernbûna wê ne ji bona ko girtî tê de rehet bikin, ji  
bona  
ko em bikaribîn bêtir lêdan û îşkencan tê de bikin, hatibû avakirin.  
Ew modernbûna girtîgehê ne jî bona başiya girtiyan bû, eksê wê ew  
bi  
wê modernbûna xwe gelekî di elehê wan de bû, ew modernbûna  
wê hêz  
û taqata me gardiyanan geştir, firseta lêdanê zêdetir dikir.  
Ez li wê girtîgehê bûme mêvan. Êdî rojên min ê li wir derbas bibana.  
Di destpêkê de, gelekî kêfa min dihat ko êdî ez ji nobedariyê û  
ecemitiyê  
xilas bû bûm, ji ber ko li vir êdî tu lêdan û nobedarî tunebû, bilaeks,  
li wir  
rehetî emir dayîn li wan mirovên xwenda û zana îşkencekirin, kesên  
di vir

de, di emirê xwe de şuxulandin hebû. Ez ê bi halê xwe yê cahîl li ser serê wan kesan bibama komutan, min ê li wir bikarîba, tiştê ko min dixwest bi wan bidime kirin. Li wir êdî min ê jî bikarîba emir û ferman bida. Êdî min ê bikarîba li wir, li wan kesên ko gelekên wan bi temenê xwe ji min mezintir, lêdan û îşkence bi wan bikira. Êdî ez ê bibama femandarek, min ê êdî li wan kesên xwenda û zana bidana ber dar û jopan, ma gelo kes hebû ko ji vê hebûna delal û berjewendiya rind re bigotina na. Bi emirê yuzbaşî em 40 kesên nuh hatin girtîgehê ko bibin gardiyanên wir. Dema em ji erebê daketin, yuzbaşî û çend leşker li dû wî hatin pêşiya me, yuzbaşî dikeniya, bi awayekî kêfxweş nêzîkî me bû, yeko yek bi destê me girt û got:

— Hûn bi xêr hatin, vê dibistana, ko gawiran dike musliman, komunîstan dike welatperwerê tirk û ew kesê ko dibêjin em kurd in, dibin tirkên esîl. Piştî bi destê me girtinê, zîvirî ser çawişê kêleka xwe û got:

— Çawuş

— Bêje komutanê min?

— Van hevalên nuh bibe cihên wan, dûre bila herin hamamê serê  
xwe

bişon, îro îstirehet bikin û serê sibê bila bi we re derkevin, gera  
girtîgehê.

— Temam komutanê min, dibe.

31

GARDIYAN

Rojtira din serê sibê em jî weke herkesekî rabûn ser xwe çûn cihê  
îşti-

mayê, (cîhê ko leşker lê fêrî kaîde û nîzama leşkeriyê dîbîn) li wir em  
diketin rêzê, yuzbaşiyê me destê wî li paş, seyê wî li dû, bi aweyekî  
bî kêf

hate ba me, li me mêze kir, mizmizî, hustiyê seyê xwe xurand, dûre  
destê

xwe di serî wî de da, hal û rewşa me pirsî, li gardiyanên berî me,  
mêze kir

û axifî:

— Van hevalên xwe yên ko nuh hatine, li hemû girtîgehê bigerin  
di-

vê ew çend rojan li ba we bin ko ew jî fêrî kar û barê girtîgehê bibin.  
Berî ko em dest bi karê xwe yên muqades(!) bikin, wan em, ew  
kesên

ko nuh hatibûn girtîgehê li hemû derê wê gerandin., Berê ji salona  
ko

mirov dikete hundir dest pê kir. Li hemû salonan, qawîşan, hucran û  
ci-



hên lêdanê gerandin, dema em ketin hucre û cihên lêdanê xofekê  
ez gir-

tim, tirsek kete nava min, ew kesên ko işkence li wan dihat kirin  
hemû bû

bûn hestî û çerm, min nikarîbû li wan mezê bikira. .

Dema ko em digeriyan li alîkî dengê xwendina sirûdên leşkerî, li alîkî  
dengê lêdan û li alîkî jî dengê qêrîn û warîna kesan dihat. Gelek  
caran

mirov ji wê rewşê diêşiya, lê ji bona ko em hîn bêtir li ser serê wan  
kesên

girtî dîn û har bibin, çawîşê blokê li me mêze kir û digot:

— Gelî gardiyanan! Yuzbaşiyê me her dem dibê ko bila zikê we bî  
van

girtiyan neşewite. Hûn nizanin ko ew çi bela ne, eger ji wan yek, we  
hin

gardiyana li dereke tenê bigire wê, we bikujin. Ji ber ko vana ne  
mirov in,

ev ew kesên xwedê nenas in, dijminê milletê tirk in. Ê ev in yên ko  
leşker

û polîsên me dikujin.

Ew axaftina çawîş, tesîr li ser me dihişt. Ew bû bû berdevkê Yuzbaşî  
lo-

ma ew jî fêrî ajîtasyonê bû bû, wî carna weke yuzbaşî him tirs di me  
de

dîfîrand û him jî rêya lêdanê dida ber me ko em jî dest bi lêdanê  
bikin.

Wî riya ko me di bin tesîra axaftina xwe de bihêle dizanî bû. Yuzbaşî  
ew

kiribû pisporekî zîrek. Eger me jî weke wî nekira him me lêdan  
dixwar

him jî bi vegera cihê ecemetyê em dihat in tehdîtkirin.

Di destpêkê de, em her kesekî ko nû hatibûn, dane cem yekî ko li  
wir

qardiyana bû, bi qedere çend rojan em weha li gel qardiyanan li  
qawûşan

digeriyan. Ji bona ko em jî fêrî lêdanê bibin, gardiyanên berî me  
banî hin

kesên girtî dikirin û ji me re digotin:

— De lê bide, niha dora te ye.

Li gor wê lêdan û êşkenceyên ko me dikir, hîlbijartina ko kî wê li  
girtîgehê bibe gardiyan dihate kirin, ew kesên baş lêdan nedikirin  
şûnde

dihatin vegerandin, yê weke min zalîm derketin, li wir man. Ji ber  
rewşa

32

## GARDIYAN

min î ne qenc û ji bo ko ez venegerim cihê ecemîtyê heta ko ji min  
dihat,

min lêdana xwe qenc dikir, min wer dikir ko dema yuzbaşî dibîhîst  
an wî

bi xwe di demên kontrolên xwe yê bi dizî dikir didît, gelekî kêfa wî  
di-

hat, loma car carna banî min dikir û digot:

— Kurê min, li gor agahdariyê ko ez distînim, tu ne mirovekî xerab  
î,

eger ev rewşa te her dem berdewam be, tê li vir bimîne û tu ê gelek diyarî

jî ji min bigire, ez ê te bikim, onbaşî an çawîş, dema tu bibe çawîş tu ê

pereyekî baş jî bigire. Tu ê bibe mirovê min î yekemîn. Lê heta taliya leşk-

eriyaya min, ne ez bûme mirovê wî ê yekem û ne jî min tu maşekî zêdeyî

hevalên xwe girt. Dawiya dawî ez tê ghiştin ko yuzbaşî ev yeka hanê ji her

kesekî ko wê biba gardiyan re digot.

Wî ez maçî kirim, aferîneke qenc li min da, kêf bû bû kêfa min, ez ketibûm, çavê yuzbaşiyê xwe, êdî hêvî û baweriyaya min çê bû bû ko ez ê li

girtîgehê bimînim. Bi kêf û eşqa ko ez ê li wir bimînim, min êdî lêdan û

êşkenceyên xwe hîn zortir û diwartir kir. Berî ko rojên min î provê biqede yuzbaşî banî min kir û got:

— Kurê min, tu weke ko ez difikirîm derket. Ez dikarim bi awayekî re-

het bêjim, ku rewşa te ji ya hevalên te cûdatir e. Loma êdî ez dikarim te li

vir bikim qomûtanê qawîşekê. Êdî ew qawîş wê ya te be, tu bi wan çî

dike, bike tu azad e. Daxwaza min ji te ew e ko bila tu carî zikê te bi wan

neşewite, ew giş, gawir in, dînsiz in, xwedê nenas in, ew dijminên welatê

me, polîs û leşkerên me ne.

Em ew kesên li wê girtîgehê bû bûn gardiyan bi her awayî azad bûn.

Çi

tiştê ko me bixwasta me dikarî bû bikira, xwarin û vexwarin pir û xweş

bû, vexwarina araqê an jî kişandina esrarê ji alî yuzbaşî de hatibû serbestkirin, kişandin û vexwarina wan, ji alî wî de dihat temîn kirin.

Carinan wî digot:

— Di demên xwe yê vexwarinê de herin nava wan xwedê nenasan wê

gelekî baştir be. Wê dema hûn ê bikaribin baştir li wan bidin. Heta ko

hûn fêr bibin, vexwarin ji bo we serbest e.

Wî her sibe, berî destpêka kar, em hemû dicivandin, nesîhet li me dikir, wî bi xwe em fêrî lêdanê dikirin. Wî di axaftinên xwe yê serê siban

de, em bi kîn û nefretê dadigirtin û bi ser wan kesên girtî de dişandin. Bi

wê kîn û nefretê me jî ew kesên di wirde hemû xayîn û dijminê gelê xwe

didît. Di bin bîr û baweriyeke weha de dema me lêdan dikir, kêfa me

gelekî dihat ko me dijminê gelê xwe dianî ser rêya rast».

33

GARDIYAN

Êdî ew kete nav meselê û pêde çû, wî dixwest ko her bûyerê ji destpêkêde,

li gor taqet û tiştên dihatin bîrê, yeko yek rêz bike. Dema ew diaxifî,  
rewşa wî car-carna nebaş dibû, car carna hêstir ji çavên wî dihat,  
car-car-

na weke gelekî poşman bû be, lê mîna zanîbû ko êdî tu fêda  
poşmaniyî

tune ew bi xwe jî baş tê ghiştibû ko dem ne dema poşmaniyê ye. Ji  
ber vê

yekê bû ko wî dixwest wan kiryarên ko wî û gardiyanên din kirine,  
bi

awayekî rast bêje, loma ew bi kîn û hêrs bû. Weha diyar dibû ko tu  
hebûnên ko ew pê bigre nemabûn. Ji bo xatirê du salan bi rehetî  
derbas

bike, çi bi serê wî hat, em guhdarî bikin.

»Ez û ev hevalên ko bi min re hatibûn girtîgehê em êdî li wir bû bûn  
gardiyan, bîr û baweriyên me, dîtî û nerînên me, heta ez dikarim  
bêjim

însanetiya me jî bû bû bi awayekî din. Dema ez wan bûyerên ko me  
dikirin yeko yek bêjim, tê jî bi xwe bibîne ko em çawan ji însanetiye  
dûr

ketibûn.

Ew kesên ko dihatin girtin, berî ko bêne girtîgehê wan işkence û  
lêdan

ji destê polîsan didîtî û demekê jî di binçavan de diman, weke diyar  
e ko

ew mirovên gelek işkence diditî û birîn li canê wan çêdibe, ji bo  
başbûn

û rehetbûna birînên wan ew li cihê binçav de dihiştin ko heta  
birînên

wan baş bibe. Ew mirovê ko lêdan û dema binçavitiyê diqedandin,  
ji alî  
dadgehê dihat ragirtin û dişandin wê girtîgeha ko ez lê bû bûm  
gardiyan.  
Kesên ko dihatin girtîhegê, berê di bin hemû metodên îşkanceyan  
de  
dihatin derbaskirin, qasî mehekê an du mehan di hucreyan de  
diman,  
dûre ji alî me de, bi biryara me ew di qawişekê de bi cih dibûn.. Me  
metodekî weha bi kar dianî ko kesên bixwastina zû herin qawişekê  
pêwîst  
bû wî/wê wan şert û şirûtên me û ew biryarên ko me ji bona hucran  
danîbûn, pêk bianîna, di wir de herkes fêr dibûn ko dawiya  
serîhildan û  
berxwedanê di hucran û di girtîgehê de tune ye, loma gelean ji  
wan zû,  
biryarên me pêk dianîn, sirûdên leşkerî zû jiberdikirin .Tiştên me  
digot,  
pêk dianîn.  
Ew kesên nuh dihatin girtîgehê, rewş û şertên girtîhegê  
nedizanîbûn,  
wan bawer nedikirin ko bûyerên weha dûrî aqilan, wê li wir bêne  
serên  
wan. Ew kesên, dema xwe ya îşkencê û ya binçavan diqedandin,  
leşkeran  
ew dibirin dadgehê û li wir yên ko dihatin girtin, ji bona me  
dişandin.

Dema ew diketin hundir, em yek gardiyan nêzîkî wî/wê an wan dibûn û

me digot:

— Hoo, hevvelatîyê min tu bi xêr û xweşî hatî vir, wey wey wey!..  
hela

34

GARDIYAN

bala xwe bidinê, wan polîsên bê bext, hevvelatîyê min kiriye çî halî!

Wax,

wax, wax xuya ye ko te ji mêj ve serê xwe neşûştiye, wax li min,  
hawar li

min, kuro ma ev karê mirovantîyê ye, de bisekine ez berê te bibim  
hemamê ko tu serê xwe bişo, xwe paqîş bike, têr nan bixwe û dûre  
here

qawîşa ko tu dixwaze, de ka kincên xwe ji xwe bike!

Girtiyên reben nizanîbûn ko wê çî bihata serê wan, loma wan ji wê  
ax-

aftina me ya ko me tinazê xwe bi wan fikir, bawer dikirin. An  
dixwastin

bawer bikin, ji ber vê yekê bû ko kêfa wan dihat û difikirîn ko piştî  
işkence û lêdanê, wê serşuştin ne xerab be. Bi wan bîr û baweriyên  
weha,

wan di xem û xeyala serşuştinê û têr nan xwarinê de, hema zû bi zû  
dest

bi ji xwekirina kincên xwe dikirin ko di zûtirîn wext de xwe bighînin  
pariyek nan û xwarinê Loma ji bilî derpî, hemû kincên xwe derdixist  
û

digot:

— Ez hazir im!

Me li halê wî û li gotara ko »ez hazirim« dinerî, em di mizmizîn, weke

gurê ko nêçîra xwe girtibe kêfa me dihat û bi awayekî fenok em bi dora

wî/wan diketin, kesên nuh dihatin, wan ê ji ko bizanîbana ko divê mirov

derpiyê xwe jî ji xwe bike, loma jî wan derpî ji xwe nedikirin heta ko me

yekî bi tinazî bigota:

— Hevwelatiyê min divê tu derpiyê xwe jî ji xwe bike, weha xuya ye ko

te zûde serê xwe neşûştiye, ji bo tu baş bête şûştin, divê tu tişteke li ser te

nemîne, ji xwe ew kincên li ser te nepaqij in, em ê yên nuh, temiz û xweştir bidin te.

Piştî axaftinên me yên weha girtî tê digihişt ko rewş ne baş e. Qederekê

xwe bi vir û wir de dibir û dianîn ko derpî ji xwe nekin, lê xilasbûna wan

tune bû. Dema wan xwe vardiqiland, an jî nedixwastin derpiyên xwe

derînin, me yekî bi hêrs digot:

— Derpê jî derx e, ma hîn tu çî sekiniye!

Ew tê digêhiştin ko êdî tu çare tune loma derpiyê xwe jî xwe dikirin, xwe şûtî tazî dikirin, dûre em yek diçûn ba wan berê li salonê digerand ko



sawa wan bête şikandin, dûre me ew kes an kesan dibir in ser wê hucra ko

tije gû (pîsîtî) bû. Çi jin, çi mêr yê ko têketa destê me, diketin wî halî.

Me

ew li ser hucra tije gû, didan sekinandin û digot:

— Xwe bavînê.

Ew weke têngihiştibin ko em ji wan re dibêjin xwe bavî yê nava wî gûyî, loma berê li dora xwe mezê dikirin, weke bide diyarkirin ko »em ê

xwe bavîn kîderê« hina ji wan dixwestin fena bikin, lê me ew fenê wan

35

GARDIYAN

bêyî ko pirsaxwe dubare bikin, hema bi yek carê, me her yekî, bi wan

darên (kalas) ko di destê me de bûn, li wan dida û ew davîtin nava wî

gûyî. Dema ko ew diketin nava gû, me hîn bêtir dest bi lêdanê dikir ko

ew xwe ji ber darên me bidin alî, dema wan xwe bi virde û bi wir de dikirin, herderê wan di nava gû de dima, him lêdaneke baş dixwarin, him

di nava gû de dihat in gerandin, dûre me ew ji vir derdixistin, li ser betonê

dirêj dikirin û bi dar û jopan bi canê wan diketin. Jop radida wan, dar li

mêranî ya wan dixist, yanî tiştê ko dûrî aqila, me dianî serê wan, ko ew di rojên ewilî de çavtirsîyayî bibin, ev plan giş yên yuzbaşiyê me bûn, lê me ji daxwazên wî bêtir lêdan li wan kesên girtî dikirin. Heta me dereke wan neda şikandin, dev jî wan bernedida. Ev yeka bû bû weke biryarake me, ya gardiyana, ji bona wan kesên nuh dihatin girtîgehê. Me navê vê metoda ko me dianî serê wan kesên nuh dihatin girtîgehê, kirîbû »bixêrhatin«. Bi vî awayî me xêrhatin dida wan û li halê wan dipirsî(!). Rojekê dîsa hinekên nûh hatibûn girtîgehê, piştî xêrhatina wan, me ew kesên nû hatibûn, birin hucrê, hebekî bi wan şabûn, dûre gardiyenekî gazî Gestapo kir û got:

— Wa Gestapo, me îro tu job ranedayî (ne xistiye) tu kesî ma tu çî di-fikire? Va ye mêvanên me jî îro hene, ma wê ne baştir be ko em dest pê bikin.

— Ma ji vê çêtir wê çî hebe! Divê em qîmeta mêvanên xwe yên nûhatî bigrin.

Gestapo ji jopxistina qûna girtiyan bi nav û deng bû bû, wî laqabê xwe

ji vir girtibû, dema ko pêwîstiya xistina jopekî heba, divê me destûr  
ji wî

bigirta, ji ber ko ew bû bû, uzmanê vî karî. Loma ew di ser wan  
girtiyên

nûh hatî de qêriya û got:

— Zû kincên xwe ji navê û berjêrtir derxin.

Kesên nûhatî, him rewşa girtîgehê baş nizanî bûn, him jî wan  
nedixwest ko kincên xwe derxin, loma jî xwe bi virde û bi wirde birin  
û

dianîn ko xwe xilas bikin, lê xelasiya wan tune bû, kesekî nûhatî ne  
mumkun bû ko ji vê lêdana xêrhatinê xilas bibana. Dema wan  
kincên

xwe dernexistin, Gestapo yê me hîn bi hêrstir diqêriya:

— Zû, zû derxin.

Lê dîsa jî tu kesî kincên xwe ji xwe nedikirin, îcar Gestapoyê me kire  
bire bir, gazî me çend gardiyanên din kir û got:

— Gardiyano, werin werin, ev kûçik lawê kûçikan, kincên xwe ji xwe  
36

## GARDIYAN

nakin, ew emirê min bi cih naynin.

Hema em çend kesên din ber bi alî Gestapo de direviyan, ew  
merivekî

gelekî tirsonek bû, di jiyana wî ya sivilîtiyê de her tade zulm didît, ji  
ber

ko ew tirsonek bû, her gav hevalên wî li wî didan, ew di nava  
hevalên xwe

de yê herî kê m dihat dîtin, dema ko ew li girtîgehê bû bû gardiyan,  
ji tol  
hilanîna, bûyerên xwe yê siviltiyê, li girtiyan dida, rehetiya girtiyan  
ji  
destê wî tunebûn, ew tucarî bi tena xwe nediwêrî bû, biçûya  
qawişekê, an  
jî bi tene xwe li kesekî bida, dema wî dixwest lêdanê bike an jî jop  
rade  
girtiyan banî me çend kesên din fikir, dema me xwe li dora wî  
dicivand,  
cesaret dihatê, mêr dibû û tiştên dûrî aqilan fikir,  
Gestapoyê me li dor xwe nerî ko em qedere 10 gardiyanan li dor wî  
ne,  
loma wî got:  
— Van kesên nûhatî, kincên xwe dernaxin ko ez jop radim wan, zû  
kincên wan ji wan bikin.  
Em çend kes li yekî civiyan kincên wî bi zorê jêkirin, serî ber bi jêr û  
qû-  
na wî jî ber bi jor rakir, tiştê ko Gestapoyê me dixwest pêk hatibû,  
karê  
me teva bû bû, her tişt ji bona Gestapo hazir bû, loma ew jî hat û  
job ra-  
da wî kesê ko di nava destê me de bû. Hingî me ew di navxwe de  
girti bû,  
wî nikarîbû xwe tev bida, bi xistina jop ya qûnê, bû qîre qîra wî.  
Qêrîniyeke weha jê hat ko ew qêrînî, qêrîniya bindestiyê, qirîniya  
bêhêviyeyê bû, dema wî job radida qûna wî, ji ber êşa job, ew kesê  
girtî

xwe dilivand, nigê xwe radikir, bi rastî jî ew êşa xistina job gelekî zor bû.

Dema wî xwe dilivan Gestapoyê me digot:

— Xwe melivîne,- û ji me re digot- baş bigrin, hîn jop giş neçûyê, baş bigrin hindik maye. Piştî ko wî karê xwe qedand ew jobê bi gû derxist, lê

mêze dikir, kêfa wî gelekî dihat, bi wê kêfxweşiyê berê xwe da ew kesên

din yên di hucran de dima û got:

— Binerin girtiyên pîs û dijminê milletê me, eger hûn zû biazil nebin, hûn bi ya me nekin, ez ê vê felekê bînim serê we jî.

Gestapoyê me bi vê kiryarê him xwe rehet kiribû, him jî wî aferîneke delal û qenc ji yuzbaşî girti bû. Ji xwe min fam nekir ko çawan li her derê

yuzbaşiyê me hazir û nazir dibû. Ji xwe her serê sibana wî serê me bi tiştên

çewto mewto dadigirt û digot:

— Kurê min ev girtiyên di vir de hemû, fêlbaz in, hemû zane ne, nerîneke wan î cûda, axaftineke wan î ko jê nayê famkirin dibe ko bibe

sebeba serî hildana girtîgehê ya girtiyan, wê demê jî ew ê we hemûyan di

vir de bikujin, yan jî hûn ê seqet bimînin, loma divê hûn amanê nedin

37

GARDIYAN

wan ko ew bi zimanê ko hûn jê fam nakin, bi axife. Divê hûn amanê

nedin wan ko ew bi çavan îşaretan bidin hev. Pêwîst e hûn ji hemû hareketê wan bi şik bin, eger hûn vê yekê nekin, hûn dikarin di vir de ji

alî girtiyan de bêne kuştin.

Êdî em, ji xwelivandina girtiyan jî bi şik bûn, ji pozkişandin û kuxikên wan jî bi şik bûn, peyva kurt ev bû ko wan çî bikira em ji wan, ji tirsaxwe

bi şik bûn. Rewşa me jî di wir de ne tu rewş bû, em jî di wir de her roj bi

xewnên nebaş radibûn, bi saya serê vexwarina, esrar, araq û haşhaşa, ko

yuzbaşî dida me, car carna me xwe ji bîr dikir, diketin kêf û şahiyê, bi vî

awayî jî em hemû bû bûn araqvexwar, esrarkêş. Ez baş dizanim ko gelek

kes wê di jiyana xwe ya siviltiyê de jî van tiştan vexwin, ji ber ko me bi şev

û rojan araq vedixwarin û esrar dikişand, ji bona me serbest bû, me çiqay

bixwesta, ewqasî kêfa yuzbaşî dihat û ji mere dianî. De bifikire ko mirovekî serxweş wê çî bike û çî neke, bi wan girtiyên ji destê me ketibûn

amana xwedê. Me weha xwe hînkiribû ko em tu carî bê sûc li kesî naxin,

loma her car me sûcek ji wan re peyde dikir û li gor wî sûcî ceza didan

wan. Yuzbaşiyê me her dem ev yeka digot: »Binerin kurên min, heta hûn

karibin, berî lêdanê, divê hûn girtiyan bi sûcekî gunehkar bikin û  
dûre li  
gor dilê xwe lê bidin wê hîn baştir be. Wê demê hûn dikarin bêjin  
ko em  
tucarî bê sûc li kesekî naxin».

38

GARDIYAN

VI

»Ji bo ko em wan kesên ne ji me, bikin mirov, êdî me di girtîgehê de  
hêdî-  
hêdî meş û ezberkirina sirûdên leşkerî fêrî wan dikir. Di destpêkê da  
me  
meşên ecemitî û dûre meşa hostatiyê û ya dawî jî meşa komando  
fêrî wan  
kir. Lê meş hemû li gor daxwaza me dihat kirin, tiştên wan dikirin  
ne bi  
dilê wan bû, lê bi hukmê zorê û lêdanê, me dixwast em her tiştî bi  
wan  
bidin qebûlkin.

Meş bê lêdan nedibû, bi darê zorê me ew fêrî meşa leşkerî kirin, lê  
em  
tenê bi fêrbûna wan î meşê nedihatin ser, me roj bi roj meş û  
xwendina  
sirûdên leşkerî zêdetir û zortir dikir. Ew kesên ko bi awayekî nîzamî  
meşnekirina an jî wan kesên ko bi meşê re bi awayekî qenc sirûdên  
leşk-

erî ne dixwendin an jî di demên xwendinê de xwe şaş dikirin,  
lêdaneke  
baş dixwarin. Em tenê bi lêdana wan kesên weha razî nedibûn, ji  
rûçikê  
wan, hevalên wan î qawişê jî têra xwe lêdan dixwarin. Me weha  
dikir da  
ko gîrtiyên din bîen teşwîqkirin ko ew jî zû fêr bibin. Ji ber ko piraniya  
gir-  
tiyan nedixwestin ko ji bo kesekî lêdanê bixwin, loma me tiştên dûrî  
aqi-  
lan dianî serê wan. Ev taktîkeke meya baş bû ko me îcad kiribû, ev  
îcat  
îcada min bû. Di dema meşê de me ji nişka ve digot: »Rûnên, rabin,  
bazdin, bisekinin, çongên xwe bikîşînin zikê xwe, dengê xwe derxin  
ûhw.  
Me weha di ser wan de dikir qêrînî ko ew xwe şaş bikin, da ko em  
hîn  
bêtir li wan xin«.  
Rojekê serê sibê dema gardiyanê me hat, qerewanên vala ji qawişê  
bir ko  
ji me re taştê bîne, berî ko derî bigire awirek da me û got:  
— «ro wê yek ji we here, hema wê here, ko ez jî nizanim, ya wê di  
nava  
du metre paçê sipî de here mal, yan jî ew ê here nexweşxanê.  
Axaftina xwe  
kir, derî girt û çû.  
Ew çû lê me hemûyan baş famkir ko îro wê rewşa qawişa me nebaş  
be,



loma me hemûyan temînî da hev ko em îro, him meşa xwe gelek qenc

bikin û him jî di xwendina sirûdên leşkerî de dengê xwe weha derxin ko

hemû rûniştvanên Diyarbekerê dengê me bibihîzin. Lê me baş dizanî bû

39

## GARDIYAN

ko me çawan jî bikra, îro wê xelasiya me ji destê gardiyan tune ba. Ji ber

ko emir hatibû dayîn, diviya bû, kesek ji qawişa me jî biçûya, tişteki ko

me bikra tune bû, li me wer hat ko ew kêfxweşiya em ê taştê bixwin ne-

ma bû. Xofekê em girtibûn, em ji rewşa xwe ya normal derketibûn, ketibûn rewşeke din. Lê çer biba wê biba, loma me taştêya xwe xwar û

xwe ji bona derketina derve hazir kir. Gardiyan gazî kir:

— Qawiş, xwe ji bo derketinê hazir bikin.

— Emir bike komutanê me.

Ji xwe em hazir bûn, nava me gişkan fikir teprep, em her yek ji xwe bi

tirs bûn, me baş dizanîbû ko wê îro yek ê ji me here. Loma gardiyan dig-

ot »wê here ku« me jî baş nizanîbû, bi vê tirs û xofê em derketin der, berê

sirûda milî ya tirka, dû re xwendina xîtaba Ataturk û sonda me. Dû  
e em

ketin rêzê, me dest bi meşê û xwendina sirûdên leşkerî bi dengê  
gelekî  
berz kir.

Gardiyan jî têgihîşt ko ev cara yekem e ko em weha bi dengê berz  
sirûda dixwînin, ew xwendina me ya weha ji tirs mirinê bû, mirin  
nêzîkî

me bû, hevalek wê ji nava me biçûya, lê wê kî ba, nediyar bû, loma  
em

her yek ji xwe bi tirs bûn. Gardiyanê me diqêriya:

— Dengê xwe rakin, ev çî deng e.

Hetanî ji me dihat me fikir qêrînî, îcar wî digot:

— Ka dengê nigên we nayê, nigê xwe hişk li erdê bidin.

Di meşê de me tu kêmasî nekir, îcar wî digot: »razê, rabe« em  
radizan û

zû bi zû radibûn, di vir de jî qasî ko gardiyan kêmasiyê tê de bibîne  
çênebû. Werhasil wî çer kir tu kêmasiya me nedît, îcar em dane sek-  
inandin. Wek her car rêzbûna me girtiyan, çariçar bûn, yanî em her  
çar

kes, dî rêzekê de bûn. Gardiyan her carê rêzek tenê derdixist meşê  
û

sirûdên leşkeriyê bi me dida xwendin, di vê rewşa weha de jî wî tu  
kêmasî

nedît.

«car em dan sekinandin, hebekî fikîrî, çû hinda hevalên xwe yên  
sekinî

bûn û li me nerî, dûre vegeriya, dîsa wî ji rêza serî de dest pêkir û got:

— Rehet, hazir be, bimeşin. Dema ew herçar dimeşyan îcar wî di nigê

rastê de komûta sekinê da. Ev komût şaş bû, lê pêwîst bû li gor vê komû-

ta şaş jî em bi awayekî nizamî bisekiniana, pêwîst bû ko wî, di nigê çepe

de bigota bisekine, wê demê rawastan gelekî rehet bû, ji xwe ew hevalê

nezan di nava me de nemabûn, lê sekina di nigê rastê de ji bona me hemûya tişteki nû bû, ew gelekî zor bû, çar rêzin ewilî bi wê komûta şaş,

lê bi awayekî nizamî sekina xwe pêk anîn, dor hatibû, rêza pêncan, di wê

40

## GARDIYAN

rêzê de jî kesekî ko temenê wî li dor 50 salî hebû, wan jî weke rêzên din

meşa xwe kirin, lê dema biryara sekinînê de ew Xalê 50 salî xwe şaş kir,

nikarîbû, li gor komûta şaş bi awayekî nîzamî bisekine, dema wî xwe şaş

kir gardiyanê me keniya û got:

— Qawiş bisekine.

Em hemû di cihê xwe de sekinîn, wî jî nêçîra xwe girtibû, kêf bû bû kê-

fa wî, hate ber xalo sekinê û bi awayekî devliken got:  
— Naxwe tu yê here mal ha, naxwe te bêriya mal û zarokê xwe  
kiriye  
ha. Baş e, baş e, tê îro ji alî min de tahliye bibe. Ez ê te têxim nava  
du me-  
tre paçê sipê û te bişnim malê, tu bawer be ez te naxapînim.  
Weha tinazê xwe bi xalo fikir, ew gotarên wî ji lêdanê zortir bû. Lê  
me  
nikarîbû, tu tiştê bikira, xalo ketibû nava destê wî, weha çend  
caran  
gardiyanê me li dor wî çû û hat, dûre li ba wî sekinê tiliyên xwe  
civand ser-  
hev, rabû ser nigê xwe yê çepê û kulmek li rûyê xalo xist, bi lêdana  
wî û  
ketina xalo bû yek, xwîn ji serê xalo herikî, herikandina xwîna weha  
ne bi  
xêr bû, loma gardiyan, rehet bû bû, li xwînê nerî kenî û got:  
— Qawiş herin û bila du kes jî vî berateyî rakin bibin, hundir û du  
kes  
jî bila vê xwîna pîs bişon. Tiştê ko wî got me zû bi zû pêk anî, ji ber  
ko me  
di rewşê weha de ecele fikir ko belkî ew heval hîn saxbe ko em  
bikaribin  
wî li gor îmkanên xwe rehet bikin  
Em reviyar qawişê, du hevala xalo anîn jor, ew hevalê me yê nîv  
dok-  
tor çû ser xalo, li rewşa wî mêze kir, mizgniya ko hîn xalo dijî da me,  
kê-

fa me hat, li gor îmkânên di destê me de, me li xalo mêze kir û xalo piştî  
sê heftan bi ser heşê xwe hat.  
Ew xalê me, kurd bû, lê ne misilman bû, ji fileyên der dora Midyatê bû.  
Ji xwe nemisilmanbûna wî bi serê xwe jî îşkencê û lêdana wî hîn zêdetir  
dikir. Sûcê wî ew bû ko çaya qaçax dikire û difroşe, hatibû îxbarkirin.  
Bi  
vê sûcdariyê xalo hatibû vê girtîgeha kesên siyasî têde dijiyan.  
Anîna wî ya  
vir bi zanebûn bû, ji ber ko xalo jî mirovekî welatparêz bû, ew ji bona gelê  
xwe dixebitî, wî her gav digot: »Em baş dizanin ko fermana filan, ji alî  
dewleta tirkan de hate dayîn, hin kurdên misilman û nezan, ji bona çend  
quruş pere, an jî ji bo ko ew ê herin cennetê em dikuştin, dema wan em  
dikuştin kêfa dijmin bêtir dihat ko em ê xwe bi xwe rabin hev, em ê hevû-  
du bikujin, bizrê dijminatiyê wê têketa nava me kurdan xwe bi xwe.  
Çiqa  
dînê me cûda be jî, em hemû kurd in, welatê me Kurdistan e. Lê ev bi  
salane ko dijmin em berra ber hev dane, divê hûn weha baweriyan bidin,

wan kesên file ko dilê wan li we vebe. Gelek mirovên me yên nezan  
jî

41

GARDIYAN

dibêjin ko »kurdên misilman em kuştinê, divê em jî tola xwe ji wan  
hilîn

în, an em tucarî nikarin bi wan re bibin bira, bi wan re li erdekî bijîn,  
çi

demê ew firseta xwe bibînin ew ê me bikujin«. Xalo weha mirovekî  
zana

û têgiştîbû...

Bi gotara meşê, Eliyê di qawişa ko ez bi xwe lê dimam de, kete bîra  
min.

Elî ji gundekî Licê bû. Ew bi xwe şivan bû. Wî ji gundê xwe pêve tu  
dereke din nedîtibû û karê wî jî tenê şivantî bû. Elî ne dibistan  
xwendibû

ne jî bi tirkî dizanîbû. Di demên meşê de dema gardiyan digot »rast«  
wî

nigê çepê diavît, dema gardiyan bigota »çep« îcar wî yê rastê diavît.

Gardiyanan kirin nekirin nikarîbûn Elî fêrî meşê û xwendina sirûdên  
leşkerî bikin. Ew jî êdî tê ghiştin ko Elî ne ji mêraniya xwe weha  
dike. Ji

ber ko wî tu tişt fam nedikir loma ew diket vê rewşê. Piştî vê  
têghiştina,

gardiyaana êdî dev jî Elî berdan.

Li ser vê rewşa Elî, me ji wî pirsî ko gelo çima tu girtinê. Wî weha

sedemê girtina xwe dianî zimên.: »Rojekê ez li ber pezê xwe bûm,  
carekê  
min dît ko leşkeran dora min û pezê min girtin, yekî gazî min kir û  
got:  
»Xwe tev mede yan na tê bê kuştin, destê xwe bi ser serê xwe de«  
min jî ji  
tirsaweke wan got, kir. Dûre hatin hinda min leşkerekî weha li min  
nerî  
û ji serbendê xwe re got: »Komutanê min ev bû ev, yê ko ji ber me  
reviya,  
şikil û şemala wî baş tê ber çavên min«. Welhasil destên min xistin  
kelepçê ez birim cihekî li wir çavên min dane girêdan, piştî çend  
kesan  
pîrs ji min kirin, pîrsên weha çewto mewto kirin ko min nizanîbû ew  
behsa çî dikin. Ji bo ko min ji pîrsê wan tu tişt fam nedikir, min tu  
bersiv  
jî nedida wan. Bi saya serê wê bêdengiya min, wan heta dikarîbûn  
li min  
didan, hemû şikilê îşkencan li min ceribandin, tu tişt ji min  
famnekirin.  
Hina digotin »wele ev serokê wan e, loma napeyive, hina digot; dibe  
ko  
ev kesekî navendî be«. Lê min ji van gotarên wan jî tu tişt fam  
nedikir.  
Piştî qedandina îşkencê û dema bin çavê ez anîm vir. Niha jî ez  
nizamin  
wan ez ji bo çî girtime, û çima weha li min didin«.

»Bi vî awayî roj bi roj xwendina sirûdan zêde dibûn, ji bo ko barê girtiyan bêtir giran bibe, ji bo ko ew êdî, tu tiştêkî din nefikirin, yuzbaşiyê me tenê bi meş û jiberkirina sirûdên leşkerî ne dihat ser, wî êdî pirtûka »Ataturk îlkelerî ve înkilap tarîhîmîz« derxist, ji bona ko girtî wê jiber bikin, emir derket me jî hema ew pêk anî, pirtûk ji 102 rûpelan pêk dihat, her kesek mecbûr bû ko wê ji ber bikin. Gelek caran em diketin qawîşan pirtûk di-girt destê xwe derek vedikir û me ji girtiyekî re digot: »Rûpelê 96-an û

42

GARDIYAN

pragrafa 3-an bixwîne« ji xwe kesê ko ev pêk neaniya tiştên wê bihata serê wî diyar bû. Bi vî awayî me ew pirtûk bi darê zorê bi wan da ezberkirin.

Li alîkî îşkencên kesî nedîtî dom dikir, li aliyê din, yuzbaşiyê me dixwest ko hemû girtiyan ji halê wan derbixe, têxe halekî din, wan seqet bike, wan bitirsîne ko ew careke din nikaribin doza welatparêziyê bikin. Ji ber vê yekê bû ko me her roj babetekî lêdanê îcat dikir û di serê wan



kesên girtî de dixiste jiyânê.  
Yuzbaşî her car ji me re digot »ew gardiyanê metodeke îşkencey a  
nuh  
peyde bikin, ew ê ji alî min de bêne xelatkirin« xelatên wî li gor dilê  
me û  
daxwaza me bû, ji ber ko me kê îcad an jî metodê lêdaneke nuh  
bidîta, ya  
hefteyekê îzin, ya jî pere ji me re dihat dayîn û ya jî bi terfiyeke  
serleşkerî  
em dihatin xelatkirin. Loma her dem û wextê me li ser fikirandin û  
dîti-  
na metodên îşkencên nuh bûn. Êvaran dema razanê em diketin  
fikiran-  
dina ko şiklekî lêdanê ya nû bibînin. Loma her kesek ji me carna  
hetanî  
serê sibana xew bi çavên me ne diketin. Me kerba bêxewbûna xwe jî  
di serê  
girtiyan de derdixist. Loma serê sibana, di dema îştîmayê de, kê çi  
dîtiba  
an kê çi îcad kiriba, berê pêşkêşî yuzbaşî dikirin, eger têteta serê wî,  
ew  
dixiste jiyânê, yanî me li ser serê girtiyan diceriband, ew îcat cih  
bigirta,  
wan kesên ko ev dîtibana, ji alî yuzbaşî de dihatin xelatkirin. Ji bo vê  
yekê  
bû ko em hemû bi hev re ketibûn musabaqeyekê, ko kî û çawan  
dikare

tiştêkî baştirîn bibîne. Ew şikil û lêdana ko me dikir, hemû ji ber serê  
me  
derdiketin. Gelek gardiyan bi xwe sadîst bûn, gelek ji wan weke  
hovan  
bûn gelek jî ji weke min nezan, feqîr û ketiyê aboriyê bûn. Me  
gelekan ew  
lêdan û işkenceyên weha ji bo berjewendiyên xwe yê şexsî di  
dema leşk-  
eriyê de dikirin.  
Hevalekî me î gardiyan rojekê dîtî û îcata xwe weha da diyarkirin.  
— Hevalno, tiştê ko ez bi rojane li ser difikirîm ev e ko mirov bi şev  
di  
hundirê qawîşê de nobedariyê bi girtiyan bide girtin. Ev dîtina min  
ji alî  
yuzbaşiyê me de jî hate tesdîqkirin û pêwîst e ko em vê yekê jî pêk  
bînin,  
bînerin bê hela trewşa girtiyan li hember vê wê çawa be. Piştî  
qederekê  
yuzbaşî jî hate nava me û wî jî ji me re got:  
— Bînerin hevalê we ..... çî metodeke xweş dît ko em li ser girtiyan  
biceribînin. Ji ber vê yekê divê hûn ji sibê û pêde vê têxin jîyanê,  
eger  
tesîra wê baş derket, ez ê wî hevalê we xelat bikim.  
Yuzbaşî axaftina xwe qedand, çend pirsên din ji me kir, hal û rewşa  
me  
pirsî, dûre got:  
— De hûn dikarin êdî îro dest bi karê xwe yê pîroz bikin, bîminin  
di

## GARDIYAN

xweşiyê de. Me hemûyan got:

— Sipas.

Em her yek ber bi qawişên xwe de çûn, ko qerewanên xwarinê ji wir bi-

girin û taştê bînin. Lê taştiya wan hema taştê bû (!) . Bi dayîna wê taştiyê

jî me gardiyanan bi ser wan de dikire bire bir û me weha got:

— Qawiş! Wan hemûyan bi hev re, bi yek dengî digotin:

— Emir bike qomûtanê me.

Bi rastî dema wan hemûya bi hev re digotin »emir bike komutanê me«

kêfa min gelekî dihat, ne ya min tenê, her gardiyanekî wir qasî min kêfxweş dibû ko ew mirovên hin ji wan doktor, hin ji wan avûkat, hin ji

wan muhendis bûn ko em ew kesên nezan weke komutanê xwe qebûl

dikirin. Gelo kêfxweşiyê weha bi dest kê diket.

— Hûn ê ji îro pê de, bi şev di qawişê de nobedariyê bigrin, her ji du saeta yek, (Ev jî li gor mezinbûna qawişan hejmara nobedarên girtî yên bi

şev dihatin guhertin) wê bibe nobedarê qawişê, di dema nobedariya kê

de, çi bibe, çi biqewime, ew kes wê berpisiyar be. Di dema nobetê de, ax-

aftin, xwe sipartina dîwêr, çûyina tuwaletê, qedexeye, tenê hûn ê,  
di de-  
ma noberdiyê de di hundirê qawişê de herin û werin, çûn û hatina  
we jî  
divê nîzamî be. Piştî vê axaftinê, min bi awayekî ji xwe bawer, gazî  
berpir-  
siyarê qawişê kir û ji wî re got:  
— Berpirsiyar (mesûl), ji niha de divê tu lîsteya nobedariyê çêbike,  
kî,  
wê çi demê nobedar be, divê bête zanîn. Kesê nobedar, pêwîst e ji  
saet  
19.00-an de dest pê bike, heta saet 06.00-ê sibê. Ha tiştê herî girîng  
wê ev  
be ko dema gardiyanek bê û wê şibaka di derîde veke, divê ew kesê  
nobe-  
dar, gavekê dûrî derî bisekine û komûta xwe bi awayekî nîzamî bide,  
ya  
na, di wê saetê de kî nobedar be ew ê gelekî lêdanê bixwe û dibe  
ko here  
hucrê jî.  
Tiştê me digotin, qanûn û nîzama girtîgehê bû, eger kesekî ew tiştên  
me pêk neaniya, me ew kesên weha dibirin hucran û li wir ew dianîn  
ser  
rêya rastî yê.  
Tiştên me digot an jî ew îcadên ko nuh dihatin didîtin, divyabû me  
hunerê wê bidîta, bê ka hela çiqas tesîr li ser girtiyan dike. Loma berî  
ko  
em biryar an jî şiklekî îşkencê yên nuh têxin pratîkê, berê em hemû

gardiyana gelekî li ser difikirîn, me di nava xwe de munaqêşe dikir,  
dûre bi

biryara yuzbaşiyê xwe, me ew dixist jiyane. Nobedariya şevan jî  
weha pêk

hat. Biryara me ev bû ko şevê şeş kes nobedariyê bigirin, her ji du  
saeta

yek dibû nobedar. Nobedarî ji saet 19.00- an dest pê dikir, yanî  
nobedarê

44

## GARDIYAN

19.00–21.00 - 21.00–23 ûhw. Di dema nobedariyê de pêwîst bû ko  
her

nobedarekî komûta xwe bidana, wî gardiyane nobedar .

Dema ji alî gardiyaneke de ew şibaka di derî de bihata vekirin, pêwîst  
bû ko ew kesê nobedar weha bigota: » Mardîn Bloka D, qawişa 00-  
an

nobedarî 23.00–01.00-ê me di dema nobedariya min de tu wuqûat  
tune

ye qomûtanê min.« Piştî ko nobedarê girtî weha komûta xwe dida  
ji bo

ko em wan hîn bêtir zivêr bikin, me weha ji wan re digot:

— Herkes raza ye?

— Raza ye qomûtanê min.

— Di towaletê de kes heye yan na?

Ji ber ko me piştî saet 19.00-an çûyina towaletê, kişandina cixarê, ji  
bilî

nobedar, li ser lingan rawestandin qedexe kiribû. Loma nobedar digot:

— Tune ye, komutanê min.

— Nobeta xwe baş bigire.

Weke me dizanîbû ko her nobedarekî girtî ji me çêtir nobeta xwe di-

girtin, ji ber ko ew kesê nobeta xwe baş û nîzamî negirtana, serê sibê ew jî

alî me de dihat îşkencekirin, ji ber vê yekê bû ko herkesî tiştên me digot,

ji me çêtir pêk dianîn.

— Emirê te li ser serê min komutanê min.

Em gelek caran, tenê bi komûtdana wan jî nedihatîn ser, diviya bû me

hin tade û îşkenceyên din bi wan bikira, loma jî her leşkerekî gardiyan li

gor însafa xwe çî bianiya serê wî nobedarê girtî, serbest bû.

Em di girtîgehê de fêrî rehetiyê bû bûn, êdî nobedariya şev ya hundirê

girtîgehê jî ji me re zor dihat, loma me ev zora xwe di pozê girtiyan de

derdixist. Deriyên qawîşan hemûyan piştî serhijmara giştî ya êvaran, di-

hat kilîtkirin û kilît teslîmî îdarê dibû, yanê bi şev ji bilî yuzbaşî tu kesekî

din nikarîbû deriyên qawîşan vekirana. Eger nobederên girtî, daxwazên

leşkerên nobedera pêkneaniyana serê sibê, berî xwarina taştê ew  
kes an  
kesan ji qawîşan dihat derxistin, li gor sûcê wan ceza li wan dihat  
birîn, ji  
ber vê bû ko her nobederekî girtî ew daxwazên gardiyanên bi şev,  
ji tirs  
xwe pêk dianîn.

Bi şev dema me nobet digirt, em aciz dibûn, di bin bêdengiya şevê  
de  
gelek tişt diketin bîra me, loma me aciziyê xwe bi hin bobelatên ko  
me di-  
anî serê girtiyan derbas dikir. Wekî: Dema ko me ew şibaka di deriyê  
qawîşan de vedikir, nobedarê qawîşê pêwîst bû gavekê, dûrî şibakê  
bisekîniya, komûta xwe bida. Her tiştê wî pêwîst bû ko bi awayekî  
nîza-  
mî bihata kirin, nobedarê girtî çî bikirana, xelasiya wan tune bû,  
dema ew

45

## GARDIYAN

şibaka di deriyê qawîşê de bihata vekirin, ew nobedar bê ceza xelas  
ned-  
ibû, loma me hina ji wan re digot, serê xwe pênc caran li dîwêr xe.  
Wî an  
wan ev tişt pêk dianîn, ew kesên ev yeka me pêk neanîna, dizanîbûn  
ko  
serê sibê wê çî bê serê wan. Loma serê xwe li dîwêr dixistin, dûre li  
me

dinerî, berê komûta xwe dida dûre digot:

— Emrê te hate cih, komutanê min.

Me bi vî awayî jiyana nobedariyê xiste pratîkê. Kiryarên me dikirin,

ji

alî yuzbaşiyê me de dihate pesindan. Ji ber ko ev yeka hanê bi girtiyan

gelekî zor dihat, him nobedar aciz dibûn, him jî bi axaftina, gardiyan

û

nobedarê girtî hemû şiyar dîbûn, xew li wan diherimî, ji xwe daxwaza me

an jî ya yuzbaşî ew bû ko tiştê ne bi dilê girtiyan be, em bibînin û pêk

bînin. Loma jî nobedarî êdî bû bû jiyana girtiyan.

Di dema nobedariyê de bi hina re axaftin, razan, rûniştin qedexe bû.

Bi

kurtasî mirov dikare weha bêje ko tenê nobedarê girtî, di dema nobe-

dariya xwe de li ser niga dikarîbû bigeriya. Wî nikarîbû li gel kesî têkilî

daniya, nikarîbû tişt bida û bistan. Eger yek ji me, em bihatana û tişt ji

nobederê girtî me bixwesta jî, pêwîst bû ko wan nedaya. Ji bona ko em ji

van tiştên xwe bawer bin, gelek caran me nobedarên girtî diceribandin,

car-carna jî yuzbaşî xwe dikir weke nobedarekî leşker yê şevê û kincên



wan li xwe fikir, li qawîşan digeriya ko bê hela nobedariya şevê çawa der-

bas dibe, ji bona ko kesek şaşitiya nekin, me gelek tişt dianî serê wan.

Şevê ez û çend hevalên gardiyan, em nobedarên saet 01.00 - 03.00-

an bûn, em ji xwe re li hundirê girtîgehê digeriyan, lê ew ger bi xwe jî, ji

me re xweş nedihat, ji ber ko em fêrî rehetiyê û serbestiyê bû bûn, loma

em aciz dibûn, ji bo ko em acizbûna xwe derbas bikin, pêwîst bû me ji

xwe re karek bidîta. Dema em di salona bloka D-yê de derbas bûn û em

hatin ber qawîşa (....) (Gardiyan nedixwest ko nav û nimrên qawîşa bide

her gav dema dihat ser nav û nimra wî digot felan kes û filan qawîş) hevlekî got:

— Hevalno ka em binerin bê hela nobedarê vê qawîşê çi dike, çawa nobedariya xwe digre. Her tiştê wî nîzamî be jî, divê em tişteki din bîne

serê wî.

Hevlekî din got:

— Çawa, em ê çi bînin serê wî.

— Em tişteki weha bînin serê wî, ko ew xwe şaş bike. Yekî din got:

— Çawa?

— Binerin, em ê çar kes di wan qulikên di şibakên di dîwar de ne biner-

in. (Di dîwarên qawîşan de hin şibake hebûn, sitara şibaka ji hesin çêkiribûn, di wan sitaran da yanî di kapaxan de jî çar qulik hebûn, dema

ew sitar yanî kapaxa şibakê dihate girtin, ew mirovên hundir qawîşê yê

derve nedidîtin, lê ew kesên li derve dikarîbûn xweş li kesên li hundir mezê

bikirana, ji xwe derdê girtiyan yê hey giran jî, yek ji ber wan qulikên di

şibakan de bûn, ji ber ko ew her dem di wir de dihatin, kontrolkirin, gelek

tiştên wan bi saya serê wan qulan dikete destê me) Em ê dudu jî herin ber

derî, eger me nobedar bi sucekî girt, ji xwe ne pêwîst e, lê na her tiştên wî

nîzamîbe, wê demê ez ê avê ji wî bixwazim, dema ko neda ez ê li ber wî

bigerim, zikê wî bi xwe bişewitînim, ez ê weha bikim ko ew avê bide min,

ji xwe dema wî av dirêjî min kir, serê sibê wê çî bê serê wî diyar e.

Me gişî bi hev re got:

— Wele ev ne fikireke xerab e, ji xwe em acizin, da ka em vê jî biceribînin.

Di wê qawîşê de çar şibake hebûn me çar kesan xwe dane ber şibakan û

me li hundir mezê kir, du kes ji me çûn ber derî. Nobedarê girtî,  
nobe-

dariya xwe nîzamî digirt, tu qusura wî jî tunebû, dema ko şibaka di  
derî

de vebû, wî bazda hat, qedere metrekê xwe dûrî derî girt, berê  
silava niga,

dûre ya serî da û got:

— Ez, S.A. nobedarê saet 01.00 - 03.00-an, qawişa me ji 52 kesan  
pêk

tê, di towaletê de tu kes tune ye û herkes razaye, tu vuqûat jî tune  
ye ko-

mutanê min.

Ji xwe her kesekî girtî baş fêrî komûtdanê û nîzamî nobet girtinê bû  
bûn. Hevalê qardiyan berê li wî mezê kir û got:

— Biner ez jî weke te nobedarê vê saetê me, ji te û min pêve tu  
kesekî

şiyar tune ye. Ez gelekî tî bûme, eger tu bikaribe qedehek av bide  
min, ez

ê gelekî kêf xweş bibim.

Nobedarê girtî got:

— Komutanê min emrê te li ser çav û serê min, lê weke tu jî dizane  
ko

dan û stendina tiştan di dema nobedariyê de qedexe ye, ez nikarim  
vê

daxwaza te pêk bînim.

Piştî vê bersîvdana nobedarê girtî, ew hevalê me yê gardiyan, gelek  
şey-

taniyên wî hebûn, car-caran ew weha diaxifî, ko mirov di bin tesîra ax-

aftinên xwe de dihişt, ji xwe ew bi vî awayî bû bû qardiyanê girtîgehê. Wî

bi awayekî dilşawatî axaftina xwe domand:

— Bi rastî ez gelekî tî bûme, ger tu qedehek av bide min, ez ji tu kesî re

nabêjim.

47

GARDIYAN

— Na komandanê min na, ez nikarim bidim, got nobedarê girtî.

Lê carakê wî xistibû serê xwe ko tiştêkî bine serê nobedarê girtî û got:

— Bi rastî gelekî tî bûme, ez soz didim te ko ez ê ji tu kesî re nebêjim, ev tenê, wê di nava min û te de bimîne. Ê hin fen û fûtên din kir, wer kir

ko bi rastî zikê nobedarê girtî bi wî şewitî. -Ji xwe, ew mirovên girtî, mirovnî gelek qenc û baş bûn, wan tu carî xerabiya kesên qenc nedixwestin û wan her car dixwestin alîkariya kesên ko pêwîstiya wan ji

alîkariyê re heye bikin. Lê me ev yeka wê demê nizanîbû. Loma nobedarê

girtî got:

— Bi rastî ev ê di nava me de bimîne?

— Belê, belê.

— Baş e, ez ji te re qedehek av bînim. Got û çû qedehek av anî û dirêjî

gardiyana kir, dema gardiyana av girt destê xwe hema weha avît ser çavê wî

û got:

— Min .....te, ez ê serê sibê çî bînim serê te, tê bibîne, ker kurê kera, ma

tu nizane ko di dema nobedariyê de her tişt qedexe ye. Me şibake bi hêrs

girt û em çûn.

Me ji xwe re lîstikek nuh derxistibû, lîstikên weha li ba me pir bûn.

Wan mirovên girtî gelek caran diketin dafikên ko me li ber wan vedidan.

Ev nobedar jî yek ji wan bû. Wî bi xwe nema dizanîbû ko serê sibê wê çî

bête serê wî.

Serê sibê me ew kiryara xwe ji hemû gardiyanan re got. Loma jî sibê zû,

di dema derxistina qarewanan de em qederê 10-15 gardiyana ketin hundirê

wê qawîşê û wî gardiyane me î fenek ko ew kes xapandibû qêriya:

— Nobedarê saet 01.00 - 03.00 ê, ko av dabû gardiyana bila derkeve.

Bi xelasbûna gotara wî, ew kes, ew reben, ew mirovperwer, sê gav avît

pêş û komuta xwe da:-«S.A. Mêrdîn emir bike komandanê min!

Em weke gurê har û birçî li dor wî civiyan, gardiyane ko ew xistibû vê

dafikê, gelekî bi kêf bû, ji ber ko wî nêçîrek bi destxistibû, loma serê wî

bilind bû, destê xwe da paş qûna xwe, bi awayekî devliken got:

— Hooo hevvelatîyê min tu çawa ye? Naxwe te av da min ha, ji dêlva

avê te karîbû tişteki din jî bida lo.

Bi xelaskirina gotara xwe, wî weha kulmek lê xist ku, girtî ket û ranebû.

Bi ketina wî kesî kêfa me gişan hatibû, loma gardiyanê li wî da, keniya û

got:

— Hela rabe, rabe tu îro bi vî awayî, nikare ji nava destên min xilas bibe.

48

## GARDIYAN

Di dema rabûna girtî de, îcar Sergardiyanê me yek lêda, berî ko ew bikeve erdê me hemûya êrîşî ser wî kir, te digot qey, mişkek e ketiye nav

lepên 10 pisîkan, me jî li wî weha kir. Me yekî ew bi lêdanê diavît ba yekî

din. Te digot qey em bi topê dilîzîn. Qêrîn û warîna wî diçû ezmana, hevalên wî yên girtî hemûya weha li me mezê dikirin, lê wan nikarîbûn

hevalê xwe ji nav destên me xilas bikin, kesekî newêrîbû dengê xwe derxe.

Me lêdana xwe domand ta ko ew ket û ranebû, lê bi rastî me nizanîbû ko

ew mir an ji xwe derbas bû, ji ber ko her tişt ji bo me serbest bû, me dikarîbû, mirov di vir de bikuştta ko kesekî nikarîbû tişteki bi me bikira.

Em tu carî ji mirin an jî seqetbûna girtiyan neditirsiyan, ew dijmin bûn,

ji bo lêdana wan em bi her awayê azad bûn.

Piştî ko girtî ket û ranebû, dilê me kete cih, me dizanî bû êdî kesekî din,

wê weke wî neke. Berî derketina me, gardiyanê qawişa wan xweste, mêraniya xwe rê girtiyên qawişa xwe bide, loma wî bi hêrs got:

— Qawiş.

Hemûyan bi hev re gotin:

— Emir bike komutanê me.

— Divê hûn sê rojan xwarinê nedin vî kesî ko ev sûçê giran anî ser qaw-

işa we, baş e. Hemûyan dîsa bi hev re gotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ew emirê ko ji alî me de dihat dayîn, pêk dihat, eger hin caran girtiyan

gelekî bi dizî bi ya me nekirana jî, bi piranî tiştên me digot pêk dihatin, ji

ber ko wan baş dizanîbû ko ew her dem di bin çavan de ne û tîn kon-

trolkirin. Wan em nedidîtin lê me ew baş ditîn. Eger tiştên ko ji alî me de

nehata dîtin hebana, bi saya serê wan muxbîran, li kîjan qawişê çî biqewimiya ji mere dihat gotin. Me di her qawişê de hevalbendên xwe

yanî muxbir dabûn çêkirin, bi saya serê wan ew tiştên di qawişan de li di-

jî emirên me dihat kirin, an jî axaftinên hin kesên ko hîn nehatibûn  
rê, ji

me re dihat gotin. Ez ê di pêş de li ser kesên muxbîr jî rawestim

Ji wan muslîxên di hundir qawîşan de dilopek av nedihat, ji ber ko  
yuzbaşiyê me weha dixwest loma wî her dem digot:

— Pêwîst e, ev girtiyên li vir her dem tî û birçî bin da ko zû werin ser  
rêya rast.

Tu rastiye bixwaze em jî weke wî difikirîn, gelek caran em ji yuzbaşî  
jî

xerabtir difikirîn. Loma di meha tebaxê û di wê germa bajarê  
Diyarbekrê

de, me bi girtiyan ve meşa leşkeriyê ya herî zor dida kirin, cihê meşê  
bi

xwe beton bû, ew betonê di nav çar dîwaran de, dema tavê (rojê)  
lê dixist

49

GARDIYAN

dibû weke êgir, dema wan meş dikir, me xwe dida ber siyê. Piştî  
çend

saetên meşa li ser wî agirî, zimanê wan di devê wan re derdiket,  
devê wan

zuha dibû, hesreta herkesekî ko qurtek av vexwin, lê ava wan baş  
nedihat

dayîn, ev jî bi zanebûn wer dibû, eger yuzbaşî bixwesta di hemû  
mûslîxên

qawîşan de dikarîbû av biherikiya. Lê wî tiştêkî weha qet ne  
dixwest. Em



tenê bi vê yekê jî razî nedibûn, dema ko av hindik dihat dayîn, wê demê  
me hîn bêtir xwarin ji wan re dibir, ji ber ko qedandina xwarina ji qaw-  
işan re diçû mecbûrî bû, eger mêr hebana wê ew xwarin neqedandina an  
jî bavêtana. Hin caran me gelek xwê dixist nava xwarina wan, di demê  
weha de kêf dibû kêfa me, me dizanîbû ko çi dikeve halê wan, di tunebû-  
na avê de, xwarina şor û zêde ji bo wan diçû.  
Dema girtî li avê digeriyan me bêtir, xwarin ji wan re dibir, dema ew li  
xwarinê digeriyan wê demê jî me av dida wan. Ji xwe daxwaza me ne ew  
bû ko ew tu carî li girtîgehê têr bixwin û vexwin. Têrxwarinê ji bo wan  
qedexe bû. Ma çawa dibû ko em ê dijminê xwe têr bikin, ma çawa dibû  
ko em ê komunista têr bikin, ma wê çawa biba ko ew kesên ko dixwestin  
welatê me perçe bikin, zikê wan bi xwarinê dagirin, di bin van bîr û baw-  
eriyên weha de mirov nikarîbû bi awayekî zelal bifikiriya. Ji xwe mirovekî  
her roj serxweş, mirovekî araqvexwar û mirovekî heşhaşkêş yan jî esrarkêş

wê çawa bikarîba bi awayekî rast bifikiriya, li me gardiyanan jî weha hat-  
ibû, me çî bixwesta yuzbaşî ji bo me dianî, heta car-carna me û wî li gel  
hev vedixwar, wî qedeha xwe li ya me dixist û digot:  
— Bi kêfa ko em ê van kesan bînin rê.  
Bîr û baweriyên me, bû bû weke yên yuzbaşî, heta car carna em bi xwe  
ji wî hîn xerabtir û hîn xeddartir difikirîn. Her tiştê me, hebûna me bû  
bû jiyana wê girtîgehê, jiyana girtîgehê jî, lêdan û îşkence bû. Di jiyaneke  
weha de mirovê çawa nebe sadîst, mirov ê çawa ji însanetiye dernekeve«.  
Dema wî digot, carna hêsir ji çavê wî dihat, carna sor û mor dibû, carna  
jî krîz dihatinê û carna weha hêrs dibû ko min digot niha ew ê li min bid  
e. Weha xuya bû ko ew êdî aciz bû bû, loma cixareyek pêxist, ew ji îzahkirinê,  
ez jî ji guhdarîkirinê westiyabûm. Ez bi xwe jî ketim wan xem  
û xeyalên girtîgehê yên ko min jî tê de derbas kiribû. Gotinên wî ew ser-  
pêhatiyên girtîgehê yek bi yek dianîn bîra min. Lêdan û nebaşiyên wan  
gardiyanan dikete bîra min, carna ez jî wer dibûm, ko min digot hema ez

ê rabim û vî bikujim ko tola xwe hêlînim, lê dûre ez li xwe hay dibûm  
ko

tol hilanîn wê bi kuştina leşkerekî nebe, kesên bixwazin tola xwe  
hilînin

50

GARDIYAN

divê gelê xwe azad bikin, heta gel azad nebe, ma wê çawa tol bête  
hilanîn.

Di van ramanên hûr û kûr de min xwe wenda kiribû. Ez çûbûm wê  
girtîgehê, ew tiştên ko dianîn serê me, ew lêdanên li ber çavên me  
ko li

hevalên me dikirin, yek bi yek dihatin bîra min, bi dengê wî ez  
hatime ser

xwe ko ew dibêje:

— De ka ez ê dîroka cixare kişandina girtîgehê jî ji te re bêjim, dûre  
em

herin malê, ez bi xwe vestiyam, wer xuya ye ko tu jî ne kêmi min e.

— Baş e, de ka bêje.

“Bi îcateke nû me kişandina cixarê jî ji bona girtiyan qedexe kiribû.

Ev

îcata leşkerekî jî hêla Derya Sipî bû. Tiştê ko me fikir ev bû: berê me  
gardiyanan di nava xwe de biryara cixare topkirinê dida û em ji hev  
bela

dibûn, em her yek diçûn qawişên xwe, dema me kapaxa şibaka ko  
di de-

riyê qawişê de vedikir, hemû girtî diketin sekina nîzamî,  
berpirsiyarê

qawişê direviya ber derî, komûta xwe ya nîzamî dida. Piştî komûta wî

min digot:

— Berpirs,iyarê divê tu cixareyên di qawişê de hemûyan bide hev. Eger

yek cixare di qawişê de bê dîtin, tu zane wê çi bê serê we.

— Tu emir bike komutanê min. Me şibake digirt û em derdiketin, me

dizanîbû ko emirê me wê bê cih, piştî qederekê dema em li qawişê vedi-

geriyan, berpirsiyarê hemû cixare li ber deriyê qawişê berhev dikir û li

benda min bû. Hemû cixare li ber derî li hêla hundir dida serhev, carna

jî dema cixarên me diqediyên, pakêtên wan li derve didan serhev û me kê

çi şikil cixare bixwesta ji xwe re derdixistin. Ji xwe di dema qedandina

cixareyên me de, me ev yeka hanê dikir. Bi vê yekê him me tiryakiyên

qawişê tespît dikir, in him ew disîplîna ko me dixwest, tesdîq dibû.

Tu

karî bêje »gelo çima we dixwest tiryakiyên qawişê tespît bikin« belê ji xwe

ya girîng jî ev bû, ji wan kesê tiryakî gelek bi saya serê cixaran, bûne alîkarên me, gelek ji wan kesên tiryakî, nikaîbûn bê cixare kişandinê

bisekinin. Me ew kesên weha derdixistin, cixare dida wan û peyv ji wan

digirt, ev jî bû bû îcata me ya nû. Bi vê metodê em gelekî bi ser ketibûn.

Her qawiş pêwîst bû ko lîsteya xwe ya cixarekirînê, rojên duşema hazir

bikirana û bidana gardiyanê xwe. Dîsa rojêke duşemê bû ko me gardiyanan gazî hev kirin Çi ye, ne çiyê, hate gotin ko qawişa ..... ketine

grewa cixare nekişandinê em çûne vir, gardiyanê wê qawişê dest pê kir û

got:

— Hevalno! qawişa min lîsteye xwe ya cixarekirînê, nedan, dema min

xwest, berpirsiyarê wan ji min re got: »kesek cixare naxwaze« bi rastî jî li

51

GARDIYAN

gor nîzama girtîgehê ev grewa cixarenekişandinê bû, hema berpirsiyarê

me yê gardiyan ê bloka D bi awayekî zirt deng li berpirsiyarê qawişê kir:

— Berpirsiyar zû were. Çi ye ev halê we? Çima we lîsteya xwe ya cixarekirînê nedaye gardiyan?!

— Komutanê min kesekî ko cixarê bikirin tune ye, hemûyan gotin em

nakirin, em ê êdî cixarê nekşînin.

Berpirsiyarê me fitilî ser gardiyanê wê qawîşê û got:

— Gardiyan zû derî veke û hemû girtiyan derxin derve, em binerin bê

hela cixarenekirîn çawa ye!

Gardiyan derî vekir, girtî yeko yek derketin derve, em li wir qeder 20

gardiyanan top bû bûn. Ji xwe di bûyerên weha de em newêrîbûn bi tenê

biçûyana ser wan. Girtî giş derketin derve. Me hina dar û hina jî jop kirin

destên xwe û ketin nav wan,, Te digot belkî em di nava kerîkî pez de ne,

tiştê ko me anî serê wan nayê gotin. Yên serê wan hate şikestin, yên

destên wan û yên nig û parsuyên wan. Tu kes bi halekî saxlem venegeriya

qawîşê. Dema me li wan dida, yuzbaşiyê me li jor li me dinerî. Me girtî

giş xistin halekî din, ew dîsa xistin hundirê qawîşê, derî girt û gardiyanê

wan deriyê şibakeyê vekir û got:

— Berpirsiyar!

Berpirsiyarê qawîşê reviya hate ber derî, komûta xwe da û got:

— Emir bike komutanê min!

— Heta saetekê divê tu lîsteya cixarekirîne hazir bike.

— Tu emir bike komutanê min!

— Ha îro xwarin ji we re tune ye, hûn sûcê xwe dizanin.

— Tu emir bike komutanê min!

Me karê xwe yê muqedes qedandibû, bi lêdana wan em jî hebekî rehet

bû bûn, hîn em ji hev belav ne bû bûn, yuzbaşî hate ba me û got:

— Aferîm, zarokên min aferim. Ez li her derê dikarim bi serbilindayî pesnê we bidim. Îro xwarina we ya nîvro li ser min e. Divê hûn herin ba-

jêr, li loqanta ko hûn dixwazin xwarina xwe bixwin û araqê jî vexwin.

Gazî sergardiyan kir got:

— Sergardiyan.

— Emir bike komutanê min!

— Ji te re pere û van hevalan bibe, li bajêr xwarinê bide wan.

— Tu emir bike!

Bi vî awayî em fêrî lêdanê bû bûn, bi vî awayî zikê me bi kesî nedişewitî, ji ber berjewendiya xwe ya şexsî me dikarîbû her tişt bikira. Li hem-

52

## GARDIYAN

ber wan bûyerên me, yuzbaşî hertişt pêşkêşî me dikir.

Dema nîvro em hemû li erebê siwar bûn, çûn ber loqanta ko di bin gokdelana Diyarbekrê de, ya bi navê »Asim Kebab Salonu« dihat naskirin, xwarin û vexwarina ko me bi lêdana wan girtiyan heq kiribû,

xwar. Bi zikekî têr, bi çavekî sor em vegeyriyan girtîgehê, ma kes hebû ko

berjewendiya xwe nede pêş. Li me jî weha hatibû, ji bo pariyek nan, ji bo

kevçiyek xwarin, ji bo rojek îzîn an jî ji bo qedehek araq, tiştê me dianî

serê wan kesên girtî dûrî aqila bûn...«

Dema gardiyan behsa cixare û qedexerina wê kir tiştêkî ko di hucran de

hatibû serê qawişa me kete bîra min. Bi rastî jî tiştêkî gelek eceb bû ko

gelek caran ji bo cixareqîşandinê gelek bobelet dihat serê me girtiyan.

Ji rojan rojê reş bû ko bi ser qawişa me de hatibû. Em, ew kesên ko li

qawişa (...) -ê diman, fermana me ya çûyina hucran derketibû. Ev yek ji

bo çî bû, me pê nizanîbû. Ji xwe dema tiştêkî ne li gor aqilê gardiyanan di

qawişê de bihata kirin, ew sûcekî mezin û gunehkariyeke giran dihat hes-

ibandin. Cezakirina wê jî di hucrayan de dihat dayîn. Weha xuya bû ko

li gor wan me jî gunehkariyeke mezin kiribû ko em birin hucrayan.

Sê rojên me qediyabû ko ne xwarin û ne jî çay bi devê me bû bû, cixarên

ko bi me re bûn roja ewilî qediyabûn. Ji bilî cixarê tiştên din hewqasî nediket bîra me. Lê bêyî wê mîrata cixarê jiyana girtîgehê gelekî zor bû.

Em di hucreyên qatê sisiyan de bûn. Di rastiya xwe de ew hucrana ji



bona kesekî hatibûn çêkirin, lê em her 10-12 kesê di hucrayekê de bi cih

bû bûn. Di her qatekî de pênc hucre li kêleka hev hatibûn rêzkirin.

Hucreyên kêleka hev, bi awayekî dizî dikarî bûn, bi hev re qise bikin û tiş-

ta bidin û bistînin. Bi vê yekê hemû hucre dikarîbûn ji hebûna hucreyekê

fêde bidîtana. Lê pêwîst bû gardiyan, ji têkiliyên me yên bi hev re haydar

nebana. Dema cixareyên me diqediyên, me gazî hucra kêleka xwe dikir û

digot:

— Hevalno, cixarên me qediyên, gelo hûn dikarin ji me re çend cixara

bişînin. Bersîva wan ev bû:

— Na, heval na, yên me jî qediyane.

Bi dengkirin û pirsê em têdigihîştin ko cixareyên hemûyan qediyane.

Me nema dizanîbû êdî em ê, bê cixare çî bikin, weke gelek caran me wê

carê jî kesere xwe berra hundirê xwe da. Ji tehamulê pê ve tu tişteki ko me

ê bikira tune bû.

Dem dema nîvro bû, gardiyan gazî kir:

53

GARDIYAN

— Ker kurên keran, çend kes zû werin jêr, em ê îro xwarinê bidin we.

Piştî birçîbûna sê rojan, xwarin wê baş û xweş ba, loma jî hema çend hevalan bi lez û bez xwe hazir kirin û li benda gardiyan rawestiyan. Hatina gardiyan, vekirina derî û derketina pênc hevalan bû yek. Xwarin

li me hate belavkirin, hevalan ew qerewanên vala birin jêr, di vegeerê de

çend sandoixên porteqalan bi wan re hebûn. Dema çavên me li wan sundiqokên porteqalan ketin, kêfa me hemûyan gelekî hat ko piştî xwar-

inê em ê portakalan jî bixwin. Her hucreyê sandixek bi para wan ket. Di

her hucreyekê de em 10-12 kes diman. Dema ko sundoqa porteqalan

dirêjî hundir dibû, kêfa me gelekî dihat û me di dilê xwe de digot: »em ê

îro têr porteqalan bixwin û bi vê kêfê me duaya xwarinxwarinê bi dengekî

gelek berz xwend. Piştî qedandina duayê hema gardiyan gazî kir û got:

— Binerin kurên keran ew porteqalên ko min ji we re anî ne, pêwîst e,

ko hûn hemûyan tevî qalikên wan bixwin, eger ez qalikekî li derûdora

we, li erdê bibînim, hûn dizanin bê wê çi bê serê we. Bi vê gotina gardiyan

re kêfa me hate şikestin û şûna wê kêfê tirsek û xofeke nû kete nava me.

Em difikirîn ku; »gelo em ê çawa van qalikan hemûyan bixwin, gelo em

ê çawa lezetekê ji van porteqalan bigirin«.

Di her hucrayekê de doşekê hebû, piştî qedandina xwarinê me ew sin-

dioqên portokalan danîn orta xwe û me xwe li dor wê da hev, ko gelo em

çi bikin ko ji van qalikan xelasbin, ji xwe bê cixaretî yê jî li serê me xistibû,

em saxmirî bûn. Di vî haletî de hevaleyê bi kêf got:

— Hevalno min rê dî, min rê dî....

Me hemûyan bi yek dengî:

— Te çi rê dît kuro, de ka zû bêje, berî ko gardiyan bê em van bixwin.

(Di cihê teng de serê mirovan gelekî dişuxule hele hele di girtîgehan de,

li hember her tiştê qedexekirî mirov rêyên xweş didît)

— Hevalno ka em portekalên xwe bixwin û qalikan jî têxin nava vê doşekê, eger pê bihesin wê demek dûr û dirêj bigre ,wê demê kes nizane

ko ev ji alî kê de ketine vir.

Ew keşifa wî hevalî bû bû wek keşîfa Kiristof Colombo ko dema

Emerîka keşif kiribû...

Me bi awayekî rehet hemû porteçalên xwe bi kêf û eşq xwarin, me porteçalên xwe qedandin, lezeteke xweş jê girt û dû re dest bi çirandina

doşekê kir. Heval destê xwe tije qalik kir û xiste nava doşekê ko wan  
bi  
cih bike, hîn wî destê xwe bi şûnde nekişandibû ko weha li me mêze  
kir,  
mizmizî, em ji wê rewşa wî î bikêf şaş bûn ko gelo çima ew weha  
mizmizî,

54

GARDIYAN

hema wî bi awayekî devliken got:

— Mizgîniya min li we hevalno, ez ne şaş bim tiştê ko destê min  
çûye  
ser, cixare ne.

Ji ber ko car carna me tinazê xwe ji bo wan tiştên me yên xilasdibûn  
bi

hev fikir. Me digot dibe ko ev heval henekê xwe dike û me gotê:

— De qeşmeriyê xwe bi me neke, ji xwe halê me ne besî me ye, îcar  
tu

jî tinazê xwe dike. De zû karê xwe biqedîne ko hîn gardiyan  
nehatiye.

Wî qet bersîva me neda, hema hêdî hêdî destê xwe ji nava doşekê  
kişand ko pênc cixare di nav destê wî de bûn. Çavê me hemûya bi  
hevre

çûbûn ser wan cixareyên ko di destê heval de bûn. Kêfa me gelekî  
hat, bi

rastî ew kêfa, ji kêfa keşîfkirina Emerîka xweştir bû. Me hema zû bi  
zû

hemû qalik di nav duşekê de bi cih kirin û gazî hevalên hucreyên din kir

ko ew hucreyên ji qawîşa me pêk hatibûn, me cixare dirêjî wan kir.

Serê

her hucreyekê cixareyek ket.

Piştî belavkirina cixareyan em, ew kesên di hucra me de hemû li hev kom bûn. Me cixara xwe pêxist û yekî ji destê yekî din digirt, hilmeke kûr

lê dixist, em bû bûn weke wan kesên esrarkêş, me yekî cixare dirêjî yekî

din dikir û me her yekê hilmek bê îman lê dida. Ji xwe heta dor hate hevalê dawî cixare jî qediya. Wî hevalî jî bi lêvşewitandina xwe, xwe gî-

hand hilma dawîn.

Piştî nekişandina cixarê ya bi çend rojan, ew hilma ko me lêxist, weke

em hemû fêkî, mêwe û xwarinên dinyayê bixwin bû. Mirov digot belkî

ev cixare xusûsî hatiye çêkirin, ew hilma wer bêhneke xweş da me ku, qet

nebên...

Belê, me bicîkirina qalikan di nava duşekê de, him xwe ji xwarina wan

azad kir, him jî bi saya serê qalîkan me cixare dît, lê dûre çi bû an wê hîn

çi biba me nema pê dizanîbû. Dibe ko ew qalikên me di doşekê de bî cîh

kir bibe bela serê hin girtiyên din...

## VII

»Her lêdan û dîtina babetekî îşkencê ji yên berê hîn zortir dibû. Ji ber vê

bû ko em her gav, di lêgerîna dîtina metodekî îşkenceyên nuh de bûn.

Her roj babetekî din yên îşkanceyê ji alî me ve dihate dîtin. Me her carê

babetekî lêdan û metodên nû peyda dikir. Ji wan yek jî hevdîtina girtiyan

û ziyaretçiyên wan bû. Me dixwest ko em weha li wan bikin, êdî kes nexwaze ziyaretçiyên wî werin. Lê em di vê de qet biserneketin. Me ji

kesên diçûn ziyaretê re digotin divê tu ji ziyaretçiyên xwe re bêje:

— Êdî bes werin ziyareta min!

Dema girtiyan weha ji merivên xwe re digotin, wan jî lê vedigerindin:

— Ji bona çî, êdî em neyên, bêyî dîtina te sebr û hewiya me nayê.

Girtiyan nikaribûn bigotina »Gardiyan weha dixwazin û dema hûn tîn

bêtir tadê li me dikin« ji ber ko di dema hevdîtina wan de ji me yek em li

ba ziyaretçî û yek jî li ba girtî radiwestiyan. Ev jî bû bû weke biryarekê ko

em girtiyan û ziyaretçiyên wan tenê li ba hev nehêlin, dema ew bi tenê di-

man tiştên ko girtiyan ji ziyaretçiyên xwe re digotin, wan jî hinekên  
din  
li ser dikirin û derdixistin derve. Ew îşkence û tadeya ko di girtîgehê  
de  
dibû, digîhandin her derê, heta gelek caran ji Ewropa heyet dihatin,  
ji bo  
vê bû ko êdî me girtî û ziyaretçiyê wan bi tenê nedihîştin û em bi  
xwe li  
hinda wan disekînin. Dema wan tişteki li dijî girtîgehê bigotina, me  
ew  
dibirin hucran li wir heta tu bêjî me li wan dixist, çend caran ziyaret,  
ji  
bona kesên weha qedexe dikir. Daxwaza yuzbaşiyê me ew bû em bi  
van  
metodan ziyaretçiyên kêmbikin, lê nebû, tenê çend kesên tirsok û  
li gor  
gotina ne komunist û kurtçî bûn ji tirsê lêdanê ji ziyaretçiyên xwe re  
dig-  
otin:  
— Eger careke din hûn werin em ê neyên dîtina we.  
Di vir da daxwaz û hêviyên ko yuzbaşî dikir pêk nehatibûn, loma wî  
serê xwe li ser metodekî nuh diêşand, difikirî û hêrs û ecêpmayî  
dima, ko  
piştî ewqas lêdan, bi hejmareke zêde ziyaretçî dîsa tene girtîgehê.  
Car car-  
na yuzbaşî çend operasyon li ziyaretçiyên jî çêkir, di wan  
operasyonan de,

wî çend kes jî dida girtinê, lêdan û işkence bi wan dikir, ko ew êdî bes

56

GARDIYAN

werin, lê wî çî dikir, hatina ziyaretçiyên ji girtîgehê kême dibû.

Rojên ziyaretê, ji heftê carek bû û qasî 20-25 saniye para mirovekî diket.

Di wê dema kurt de tenê girtî û ziyaretçiyên xwe dikarîbûn li hev mêze

bikin. Ji xwe me axaftina, ko li gor me fuzûlî, ji holê rakiribû, tenê gir-

tiyan dikarîbûn, ji mirovên xwe re bigotina: »tu bi xêr hatiye, tu çawa ye,

ez baş im.« Li gor wê kêmwextiyê, dîsa ziyaretçî gelek dihatin. Em bi xwe

gelek caran ji ber vê rewşê şaş û matmayî diman ko wan girtiyan çawa

tehamula lêdan û işkencên weha dikirin. Ew çawa ji vê çûyin û hatinê

zivêr nedibûn. Em ji ber vê rewşa wan î çûyin û hatina ziyaretê şaş mabûn, gelek kes êdî me dinasîn ko ew her rojên ziyaretê li girtîgehê

amade dibûn. Rojên ziyaretê ji bona me him dawet û him işkence bûn.

Dawet bû, ji ber ko wê rojê me lêdanek taybetî dikir û em li wan kesên



xwenda û zana siwar dibûn. Ew roj ji bona me îşkenceyeke taybetî bû. Ji ber ko em gelekî diwestiyan, ji birin û anîna girtiyan, ji serê sibê heta êvarî rûniştina me tunebû.

Di destpêka ziyaretê de me ew lîsteyên ko ziyaretçiyên wan dihatin di- girt û diçûn qawişan û navê wan dixwendin, ko ew xwe hazir bikin. Dema me ew derdixistin derveyî qawişê, ji bo ko em wan bibin, me ji wan re digot:

— Binerin divê hûn tu îşaretan nedin, an axaftinên zêde nekin. Eger hûn di cihê ziyaretê de bi awayekî nîzamî nekinin, hûn ê bi saxî ve- negerin qawişê. Berî ko em wan bibin bi fortên weha me ew li salonê, li benda dora wan didan sekinandin. Li wir carna me li wan dida, carna jî xeberê nebaş digot, ji ber ko hin kes hebûn, ji lêdanê zêde xuy nedikirin, lê dema me çêr (axaftinên nebaş, xeber) dida, bi wan gelekî nexweş dihat, gelek pê diêşîyan. Dema dora wan kesên ko wê biçûyina ziyaretê dihat, me ew dixistin rêzê û em her yek li wan siwar dibûn, ko ew me hetanî ber cihê ziyaretê hilgirin. Em her yek 70-80 kilo li wan kesên hestî û çerm

mabûn siwar dibûn, bi zorê em hildigirtin, ji ber hemû bê teqat û bê hêz

ketibûn. Me kêfeke gelekî xweş dikir, me gazî hevalên xwe dikirin, tinaz

û henekê xwe bi wan dikir, carna hin hevalna digotin :

— Hespê min ji yê te baştir e. Yekî din digot:

— Hespê min yê rewan e,

— Na wele hespê min ji yê we xurttir e, binerin ez li wî didim, lê ew nakeve erdê.

Ji bilî zimanê tirkî, bi zimanekî din axafin qedexe bû, eger kesekî ev pêk

neaniya, me ew dibir hucran û li wir her babet îşkence bi wan dikir, ne

57

GARDIYAN

tenê girtî, pêwîst bû ko ziyaretçiyên wan jî tenê bi tirkî qise bikirana. Gelek ziyaretçiyên ya bi tirkî nedizanî bûn, yan jî haya wan jî biryareke

weha tunebûn ko ev pêk nedianîn. Wê demê me, ew girtiyê ko ziyaretçiyê wî, bi tirkî qise nedikir, ji cihê ziyaretê derdixist û dibir cihê lê-

danê. Bi vî awayî me rojên ziyaretê li wan kiribû rojê agir, roja lêdan û

îşkencan. Lê me çî dikir û ne dikir, ziyaretçiyên wan kême ne dibûn, ji bo

nekêmbûna wan, em û taybetî yuzbaşiyê me, gelekî aciz dibûn».

Dema gardiyan behsa sûcan kir rewşa hevalê Nûrî, ko çû bû ziyaretê

kete bîra min. Rojeke ziyaretê bû, ko bi dîtina merivekî xwe kêfa me gelean dihat, hele hele dema gardiyan navê hevalê Nûrî xwend, kêfa wî

ji ya me bêtir hatibû, ji ber ko mala wan li Mêrdînê bû û her hefte mirovê

wî nikarîbûn bihata dîtina wî, dema ziyaretçiyaekî Nûrî dihat, ken bi rûyê wî diket, bi kêfeke weha bi xwendina navê xwe wî jî xwe li ber derî

amade kiribû ko gardiyan were û wî jî bibe cihê ziyaretê.

Saeta wê gruba ko hevalê Nûrî jî di nava wan de bû, hatibû ko gardiyan

hate banî wan kir, hemû heval bi kêf derketin, lê yê herî bi kêf Nûrî bû.

Gardiyanan ew derxistin û birin, piştî ko ji cihê ziyaretê vegehiyan herke-

sek bi nizamî û bi serhejmar ketin hundir, tenê Nûrî li der di nava wan

gardiyanan de ma bû, gardiyan gazî kir:

— Nûrî.

— Emir bike komutanê min.

— Kurê kerê, ma min çend caran ji we re gotiye ko qisekirina bi kurdî

qedexe ye? Çima te bi kurdî li gel bavê xwe kiseqir, te got »bavo lûfik«.....

— Komutanê min wele ez bi kurdî nepeyivî me.

— Ha tu min derewçîn derdixê ha. Ê bû tepe repa joban.

— Na komutani min na, tenê min got bavo ji min re lûfîkekî bîne.

— Aha biner dîsa tu bi kurdî axafî.

Tiştê ko em tê ghiştin gardiyan ji bona wê bêjeya »lufik«ê li Nûrî dida.

Nûrî jî tê ghişt ko sedema lêdanê ev e, Nûrî çi kir ko gardiyan ji wî baw-

er nekir ko »lûfik« bi tirkî »lîf«e, loma gardiyan gazî hevalê mesûl kir:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Zû derkeve derve. Hevalê mesûl bi lez û bez derket wî jî komûta xwe

bi awayekî nîzamî da. Gardiyan got:

— Biner tiştê ez ê ji te bipirsim, divê tu bi awayekî rast bêje, ya na tu

dizane wê çi bê serê te jî.

— Emir bike komutanê min.

58

## GARDIYAN

— Lûfik çiyê?

— Komutanê min »Lûfik« bi kurdî ye û tirkiya wê jî »Lif« e, ji bilî vê ne tu tişteki din e.

Dîsa rojêke ziyaretê bû, navê min hate xwendin ko herim ziyaretê.

Ji

xwe tu hefteyên ko ziyaretçiyên min nehatana tune bû. Ji ber ko pîreka

min her hefte rojên ziyaretê li ber deriyê girtîgehê amade dibû, heta cari-

na hevalan henek dikirin û ji hev re digotin:

— Gelo hefteyekê xwişka me Hava neyê wê çi be?

Yekî din digot:

— Wele ez ji vê duayê re nabê amîn, ne mumkune ko Hava neyê.  
Hatina wê gelekî baş e, moralê dida hevalê Sîdar, rojên ziyaretê  
Sîdar çiq

lêdanê bixwe jî ji bona wî ne ewqas girîng e.ûhw.

Dema navê min hate xwendin ez jî weke hevalan, li benda dora  
çûyinê

rawestiyam, piştî ko gardiyanê me got:

— Ew kesên min navên wan xwendin bila derkevin.

Me hemûyan bi hev re got:

— Emir bike komutanê me.

Dema min xwe gîhand cihê ziyaretê, tenê diya min li benda min bû.

Bi

hatina diya xwe tenê tirsekê ez girtim ko gelo çima ew tenê ye, ji  
ber wê

bi tirkî nizanîbû, ew ê çawa bi min re qise bikira! Ez jî ketim hundir  
kabîne, hema diya min bi tirkî got:

— Kurê min tu çawa ye?

Ez weha tê gihîştim ko diya min bi tirkî fêr bû ye, loma vê carê ew  
bi

tena xwe hatiye ziyareta min ko hunerê xwe nîşanî min bide, hema  
min

jî bi tirkî û bi kêfa ko ez yek ser bi wê re qise bikim, lê vegerand.

— Ez başim dayê, tu çawa ye?

Bi vê gotina min re çavê diya min tije hêsir bûn, devê xwe venekir,  
hinekî ponijî û dûre bi kurdî got:

— Ez başim lawo, hema bila tu û hevalên xwe ji min re sax...

Hîn gotina wê neqediya bû, gardiyan bi milên min girt û ez ji wir durx-

istim û birim salonê. Li wir têra min li min da ko çima diya min bi kurdî

peyiviye.

Piştî ji girtîgehê derketim, rojekê diya min li kêleka min rûniştîbû.

Destê xwe da ser serê min bi porê min lîst û nişkave got:

— Wa Sîdar, tew aniha kete bîra min ko rojekê ez bi tena xwe hatibûm

ziyareta te.

— Belê dayê, belê.

59

GARDIYAN

— Kurê min, hîn min axaftina xwe neqedandibû ko hema tu bî carekê

veji ber çavên min wenda bûyî, min nema dizanîbû çi bi te hat. Ma xêr

bû?

Min bi awayekî bi ken bersivand:

— Dayê dema te bi kurdî gote »ez başi m« gardiyan bi milên min girt

û ez birim cihê lêdanê li wir heta tu bêje li min da.

— Wey ez bi qurban, ma min nizanîbû lawo, tirkiya min jî hew ew du

bêje bûn, piştî ew qediyar min nexwest ez qise bikim,. Min got tenê ez ê

ji xwe re li te binerim. Lê min xwe negirt û bêhemdî bi kurdî ji nava  
lêvê  
min derket.  
»Rojên ziyaretê ji bona me karekî zehmet bû. De were girtiyan bibe  
û  
bîne, ji serê sibê hetanî êvarê rûne ne. Me gelek caran bi rehetî  
firavîn  
nedixwar, em ji vê yekê gelekî hêrs dibûn û me hêrsa xwe di serê  
girtiyan  
de derdixist. Bi lêdan û îşkenceyên taybetî dixwest ko ziyaretçiyên  
gir-  
tiyan kêmbibein. Me dixwest ko girtî ji kesên xwe re bêjin bes  
werin. Lê  
me çî kir û nekir em bi vê yekê bi ser neketin. Me li wan kesên ko  
zi-  
yaretçiyên wan dihatin, dixistin û ji wan re digot: »ji bo çî  
ziyaretçiyên te  
tên« û li wan kesên ko ziyaretçiyên wan nedihatin jî dixist ku«çîma  
zi-  
yaretçiyê nte nayên« êdî girtî ji me zivêr bû bûn, wan jî êdî ne  
dizanibû  
ko ew ê çî bikin, ji ber ko me aciziyên xwe bi lêdana wan derbas  
dikir«.  
Rojek ji rojên ziyaretê bû. Ji xwe êdî em jî fêrî wê rojê bû bûn, ko ji  
alî  
gardiyanan de, têra xwe û bi lêdaneke taybetî dihatin cezakirin. Ew  
aciz

bûn ko »çima ziyaretçiyên me tîn«. Lê me jî dixwestin ko ew werin.  
Ji ber

ko gardiyan wê rojê gelekî diwestiyan, ji destpêka ziyaretê hetanî  
qedand-

inê, ew jî bi me re diçûn û dihatin, gelek caran jî ji ber deriyê qawişê  
het-

anî cihê zyaratê li me siwar dibûn. Ji xwe ew tiştên ko ji me re  
dihatin

gardiyanan yê bi kêrî wan dihat, ji xwe re dibirin, tiştên digîhandin  
me

jî, ne bi awayekî saxlem bûn. Weke; gomlek hustukira wan dihat çirandin,  
çakêt astarê wan dihat derxistin ûhw.

Belê gruba qawişa me ya ewilî çûbûn ziyaretê, di vegeerê de, li ber  
deriyê

qawişê, gardiyan got:

— Têkevin hundir. Hemûyan bi hev re weke elokan deng derxistin û  
gotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Piştî qederekê deng bi gardiyanê me ket û got:

60

GARDIYAN

— Ew kesên çûne ziyaretê û tiştên xwe ne girtine bila werin û bêjin.

Bi

qedandina wî hema hevalê Azîz ji nava me derket çû ber derî, berê  
silava

bi niga, dûre ya bi serî û dawî jî got:



— Azîz Mêrdîn emir bike komutanê min. Piştî komûtê, Azîz domand.

Komutanê min, bavê min ji min re çeqmaq anîbû, lê ew çeqmaq ne di nava tiştên min de bû.

Ji me yekî weha bigota xelasiya me ji destê gardiyan tune bû, ji ber ko

bi vê gotarê gardiyan dibûn diz, ma gardiyan tucarî dîziyê dikin, li gor

gardiyan tucarî tiştên xerab dikin.(!) Na, na, lê îro hevalê Azîz, bi wend-

abûna çeqmaqê xwe ew kiribûn diz(!) . Ev ji bona gardiyanan kêmanî

bûn, ma çawa dibe ko ew diziyê bikin(!) Ma ev gotara hanê, wê çawa ji

Azîz re bi ma. Loma gardiyan bi hêrs got:

— Baş e, derkeve derve

Heval Azîz bawer dikir ko wê gardiyan çaqmaqê ko bavê wî, jê re aniye

lê vegehrîn e. Derketina Azîz û tepe repe lêdanê bû yek. Axîn û qêrîn bi

Azîz ket. Em, ew kesên di hundir de, me nedizanîbû ko êdî wê çi bê serî

wî. Piştî lêdanê gardiyan rawestiya û got:

— Kurê min çi yê te wenda bû ye.

— Azîz Mardîn emir bike qomûtanê min, bavê min ji min re çaqmaq anîbû, lê min hîn ew negirtiye.

Di xelasbûna gotara Azîz de hema gardiyan çend kulmên din li wî xist,

dîsa bû tepe repa wan (Ji dengê lêdanê em têgihîştin ko ne tenê gardiyanê

me li ber derî bû, bi wî re çendên din jî hebûn) li ser serê Azîz.

Gardiyanê

me bi zirt got:

— Kurê kerê, tu çawa me dike diz? Tu çawa ew Mehmetçikê ko namûsa we diparêzin dike diz. Naxwe tu xayîn e, yanîtu dixwaze hemû

Mehmetçikan dîzek bide naskirin? Naxwe tu ye, yê mejiyê kesên nezan

dişo.

Wan weha sûcê hevalê Azîz giran kirin ko ew bi xwe jî poşman bû bû,

lê êdî tiştê ji destî wî nedihat. Ev kiryarên wan î weha ji bona ko kesên

din nebêjin tiştê me wenda bû, dihate kirin. Bi rastî jî ji wê rojê pê de, çî

tiştên me kê wenda biba, me nema diwêrîbû bigota. Dûre gardiyan got:

— Naxwe te em hemû gardiyan kirin diz ha!

— Na, komutanê min na, estefxuralla qesta min ne ew bû, ko ez komutanê xwe bikim diz, na heşa, ew kesên namûsa me diparêzin, ma wê

çawa tiştên me bidizin. Ne mumkun e ko ew tiştêkî weha bikin, dibe ko

ketibe, dibe ko bavê min bi şaşî gotibe.

## GARDIYAN

Bi lêdaneke baş, hevalê Azîz him bavê xwe derewçîn derxist û him  
jî ew

çeçmaqê ko bavê wî ji wî re diyarî şandibû girt(!).

»Piştî rojên ziyaretê me girtîgeh dikir du beş, beşek serê sibê û beşê  
dudiyar jî piştî nîvro, saxtiya qawîşa û girtiyan dikir. Serê sibê piştî  
taştê

û serhejmarê me hemû qawîş derdixistin salonê, hemû girtî li wir  
tazî

dikirin, yeko-yek kincên wan kontrol dikir, bi jobên xwe me car  
carna li

qûna wan jî mêze dikir ko bê hela tiştekek heye yan na. Ew weha tazî  
li wir

dihatin sekinandin, carna lêdan carna jî meşa di cih de dikirin ko  
heta

lêgerîna qawîşê xilas bibe.

Di qawîşê de me tiştekek li ser tişteki nedihîşt, cilên wan diçirandin,  
pere

û saetên wan ji xwe re dibirin, doşekê wan diçirandin ew pemboyê  
nava

doşekan hemû bera ser hev didan, yek doşek saxlem nedima, bi  
mebesta

ka hela bê wan tu tiştên xwe yên bi dizî di hundir doşekê de  
veşartine an

na. Me bobelatdianî serê wan, piştî saxtîkirinê, me ew dixistin  
hundir û

pêwîst bû ko wan berî serhejmara êvarê qawîşa xwe weke berê kiribana,  
doşekê xwe dagirtibana, kincên xwe ji nav hev veqetandibana. Bi vî awayî  
jî dilê yuzbaşiyê me ne dihat cih loma wî dixwest ko em hîn bêtir tiştan  
bînin serê wan.  
Ji ber pîrbûna ziyaretçiyên, di seranserê girtîgehê de me hemû karên  
xwe yê şexsî bi girtiyan didan kirin. Di destpêkê de me kincên xwe û  
gelek karên xwe yê şexsî bi wan da kirin. Weke: Şûştina kincan, şûştina  
firaxên mitfaxê, haziriya xwarina hemû girtîgehê ûhw. Ji bona karên we-  
ha me hemû qawîş xistibûn dorê. Me weha li wan kiribû ko dema hîn em  
li derve bûn, me gazî qawîşekê bikira, pêwîst bû ko hemûyan bi hev re  
bigotina »emir bike komutanê me«an jî dema me bigota bila kesek xwe ji  
bona derve hazir bike, pêwîst bû ne yek, ber derî ji girtiyan bihata da-  
girtin û dema vekirina derî li gor pêwîstiyê me çend kes derdixstin, yê  
din vedigeriyan cihê xwe«.

Qawîşa ko ez tê de bûm, dora me ya hazirkirina malzemeyên xwar-

inçêkirinê hatibû, ji bo vê, dema gardiyan hîn li derve gazî qawişê  
kir û

got:.

— Qawişa ...

Me hemûyan bi yek dengî got.

— Emir bike komutanê me.

— Bila çardeh kes xwe ji bona derketina derve hazir bikin.

62

GARDIYAN

— Tu emir bike komutanê min.

Ew dengê me î weha bi hev re weke dengê Elokkan derdiket. Dema  
mirov dihare nava wan û difîkîne, hemû bi hev re deng derxin: Gul,  
xul

gul, xululu.

Li me girtiyan jî weha hatibû, dema gardiyana li derve bigotina  
qawiş,

me jî bi yek dengî bersîv didan.

Gava gardiyan hate ber derî, em gelek kes ji bona derketina derve  
li

benda wî bûn, bi vekirina derî re, me yeko û yek xwe jimart û em  
der-

ketin derve, hevalê dawî jî got:

— Çardeh û dawî ye komutanê min.

Wî derî girt em dudo dudo ketin rêzê, nig fer û nig çot bi me da kirin.

Dûre bi meşa komando û xwendina sirûdên leşkerî, berê me da  
matbaxê.

Dema me xwe gîhand matbaxê ,li wir çardeh telîsên tije hebûn,  
gardiyan

emir da û got:

— Qawiş bisekine. Em bi yek tepînê û repînê re sekinîn. Wî domand:

— Her kesek li ber telîsekî bisekin in. Em ji hev belav bûm, zû bi zû  
em

her yek li ber telîsekî sekinîn, me bi lez û bez fikir ko dereng  
nemînin.

Eger kesên dereng bimana têra xwe lêdan dixwarin, ji bo ko em  
lêdanê

nexwin, em fêrî zûbûna kar bû bûn. Dû re gardiyan got:

— Her kes weziyeta telîshilgirtinê bigir in. Me devê telîs li hev  
dipêça

û destên xwe li dor devê wî dişidand, me hebekî xwe bi ser telîs de  
xwar

dikirin û li benda emirekî din radiwestiyan. Wî got:

— Hilgire.

Bi dayina wî emirê re jî pêwîst bû ko me hemûyan bi hev re û bi yek  
carê, barê xwe daniya ser pişta xwe, me ev karê xwe jî diqedand  
îcar wî

dîsa digot:

— Qawiş bi awayekî nizamî ber bi pêş de bimeşin. Dibû tepa repe  
me,

bi yek dengî, bi yek nîzamê, me dest bi meşa xwe fikir, li ser pişta  
me ew

telîsê giran û bi awayekî nîzamî meş û xwendina sirûdên leşkerî  
dixwendin, di bin barê giran de, em diketin rewşeke ecêp, ji xwe kêf  
û

zewqa gardiyana jî, ji rewşên me î weha re dihat. Car carina jî wî digot:

— Yek. Me digot:

— Dudo.

Ew telîsên tije fasuliyên kesk ê taze û ne ji bo xwarina girtiyan bû, jî bona gardiyanan bûn. Dema ko em dihatin ber deriyê qawişê me yek bi

yek hejmarê xwe digot û diketin hundir qawişê û yê dawî digot:

— Çardeh û dawî ye, komutanê min.

63

GARDIYAN

Piştî serhejmara girtîgehê ya êvarî, pêwîst bû ko ew tiştên ketine hundir

hemû bihatana paqijkirin. Paqîşkirina wan fasuleyan ji bona qawişeke

biçûk, heta serê sibê didomand, piştî wê demê êdî kesek nikarîbû razan Ji

ber ko dema rabûna sibê bû. Bi vî awayî gelek caran wan hin qawiş weha

heta serê sibe nedidan razandin. Ji xwe ev kar ne karê me girtiyan bû, ji

bona ko gardiyana ji xwe re vexwîn û kêf bikin, wan ev bi me didan kirin.

Yuzbaşî jî ji vê rewşa ko gardiyana dianî serê me, agahdar bû bû, loma kê-

fa wî jî ji vê yekê re dihat.

64

## GARDIYAN

### VIII

»Hêdî hêdî dawayên girtiyan dihatin dîtin. Ev ji bona me, him karekî nû,  
him jî awayê lêdanê yên nû derdixist holê. Ew kesên ko dawayên wan  
vedibûn, ji alî dadgehê dihatin bankirin, gelek kes bi hev re diçûn û di-  
hatin. Di her vekirina daweyekê de, ne kêmî 10-20 kesî heta gelek caran  
hîn jî bêtir dibûn, birin û anîna wan ne weha rehet bû, ji xwe dema daw-  
evêkirinê yuzbaşî em hemû top dikirin û dîgot:  
— Hevalno, (wî di rewşên nazîk de weha xîtabî me dikir) binerên ji îro  
pêde ev karê we yê muqades dikare hîn zortir bibe, ji ber ko êdî hûn ê van  
kesên dijminên gelê me bibin dadgehê û bînin, di birin û anîna wan de  
divê hûn gelekî agahdarî xwe bin, hevalên wan, yên li derve dikarin bi çek  
werin pêşiya we, we bikujin û wan birevînin, ya dudyan ew bi xwe jî  
dikarin li we bidin û xwe ji makînan bavên û birevin. Ji bo vê yekê ye ko  
divê hûn gelekî agahdarî xwe û wan bibin, pêwîst e ko hûn, hîn bêtir agahdarî xwe bin.



Dema kuştin an lêdana me dikete holê, me nema tu tişt dinasî, ji dilva ko em ê bêne kuştin, bila hinên din lêdanê bixwin çêtir e. Bi van bîr û bawerîyan dema me ew dibir û dianîn tiştê ko dihat serê wan, ji bona me bû bû îşkence û lêdaneke taze. Me çûyîn û hatinên dadgehê, li wan kiribû rêya îşkencê. Ji ber wê îşkenca ko me li wan dikir, gelek ji wan nedixwestin herin dadgehê, ji xwe armanca yuzbaşiyê me jî ev bû. Daxwaz û biryara yuzbaşiyê me ew bû ko dema riyeke ji kesên girtî re bihata vekirin, wî bi her awayî dixwest wê bi-gire. Tiştê yuzbaşiyê me jê ev bû, ko gelek kes di neticeyên dadgehê de, dikarîbûn bê suç bihatana dîtin û azad bibana, bi rêya berdanê, girtiyên me kêmbûn, ev kêmbûn jî ne dihate hesabê yuzbaşiyê me. Zêdebûna girtiyên kêfxweşaya me û wî bû. Serê sibana berî belavkirina taştê me li hemû qawîşan navên kesên ko wê herin dadgehê dixwend , da ko ew jî piştî taştê xwe hazir bikin. Ji xwe tu haziriya wan î zêde tune bû. Haziriya wan ew bû ko dema me gazî wan

bikirana, ew zû bi zû derbiketina der. Li wir tiştên xweş(!) me dianî serê

65

GARDIYAN

wan. Piştî xwarinê em gardiyan li qawişan belav dibûn, her qawişek em

çend gardiyan diçûnê, navê wan kesên ko wê herin dadgehê dixwend û

ew derdixistin derve. Me, li wir bê gotin û pirs têr li wan dida, ev ji bo

çavtirsandina çûyina dadgehê bû, dûre me ew şûtî tazî dikirin, bi sedema

ko em wan kontrol dikin, bê ka bi tu kesekî re tiştên qedexekirî heye ya

na. Ji xwe me dizanî bû, ko kes nikare tu tişteki bi xwe re derxin. Girtiyan

jî ev yeka baş dizanîbûn. Lê dîsa jî me li wan weha fikir, ji ber ko yuzbaşiyê me gelekî ji wan ditirsiya. Her dem tirsî girtiyan di dilê yuzbaşî

de bû, her gav wî digot: »Evana dikarin xilas bin û me hemûyan bikujin«.

Ev tirs qet ji dilê wî dernediket.

Piştî me kontrola xwe ya ber deriyê qawişê diqedand, ew dixistin rêzê û

em her gardiyanek li yekî ji wan siwar dibûn, heta cihê ko hemû girtî lê

diciviyên. Li wir diviya bû ko serê hemûyan di ber wan de ba. Lewra

yuzbaşıyê me ji me re di got : »Binerin hevalno, vana mirovên gelekî fêl-  
baz in. Dema ew li hev binerin, ew dikarin bi çavan îşareta bidin hev, yekîtiya xwe li hember we pêk bînin û li we bidin, ji ber vê yekê ye ko di-  
vê hûn rê nedin wan ko ew li hev mêze bikin.« Dema lêdana me diket or-  
tê, me çî dikir û çî nedikir, me nedihîşt yek serê xwe rake û zêdeyî pêşiya  
xwe bibîne, zêdeyî niv metro, pêşiya xwe dîtîn, ji bona wan qedexe bû,  
eger ji wan kesekî serê xwe hema bi şaşî çenekî zêde rakiribana, dibû tepe  
repe joban li ser serê wî. Me dîtîn û nerîna wan li gel hev qedexe kiribû.  
Herkesê ko ji alî gardiyanê xwe dihat wir, pêwîst bû li wir bisekinyana ko  
heta hemû girtiyên ko wê biçûna dadgehê bihatina. Sekina li wir ji xwe  
lêdan û îşkence bû, ji bilî vê jî, meşa di cihê xwe de bi wan dihate kirin û  
sirûdên leşkerî me bi wan didan xwendin. Ji her çar aliyên salonê de dengê ledan û qêrînê dihat, roj dibû roja me. Piştî hemû girtî ji alî gardiyanên xwe dihatin wê meydanê, dûre sergardiyanên me diketin nav  
gartiyan, têra wan li wan didan. Ji xwe cihê ko sergardiyan hazirbana her-

tişt ji alî wan de dihat meşandin, karê lêdanê û zirtan ji me re nedima, ser-

gardiyaana fort û zirtên xwe jî dikirin û digotin:

— Binerin li dadgahê, çûyîna toweletê, pozê xwe kişandin, av xwestin,

li dereke din nêhêrtin, ji bilî pirsên sawcî û hakîm, tiştên din gotin qedex-

eye. We fam kir?

Kesekî vê famneke tune bû, loma jî hemû girtiyan bi hev re digotin:

— Tu emir bike komandanê me.

Biryara yuzbaşiyê me ew bû ko hemû girtî, bi kincên rengî herin dadgehê û werin ko kesek bireve, ew dikare di nava wan kincên de zû bête

66

## GARDIYAN

girtin. Loma jî em ketibûn ambarên ordiyê ji bona girtiyan, ew kincên ko

bi salan e ji alî leşkeran de nedihat li xwe kirin, dianî û li wan dikir, bîh-

neke gelekî pîs ji kincan dihat. Me nikarîbûn xwe nêzî wan kincan biki-

ra, lê girtî di nava wan de rojekê disekinîn, ji wê bêhna genî gelek ji xwe

derbas dibûn. Me ew kincên weha pîs didan ser hev, komî cîhekî dikirin,

piştî ko hemû girtî diketin rêzê, me gardiyanan her bedlek ji bo kesekî

datanî nêzîkî wî û sergardiyan digot:

— Waziyeta kinc li xwe kirinê bigrin!

Bi rastî dîtin û gotin ne weke hev e, dema ew emir ji wan re diçû,  
gavakê

bi pêşde dihat in, li ber cilên xwe radiwestiyan û xwe hebekî bi ser  
cilan

de ditewandin. Waziyeta kinc li xwekirinê weha bû, eger kesekî  
destê xwe

bi kincanbikirana, an jî kesekî xwe netewanda, delîl li halê diya wî  
kesî

bû. Piştî emirdayînê, sergardiyan serê xwe radikir weha bi awayekî  
ji xwe

bawer li girtiyan dinerî, bê hela her kesekî emir tam bi cih anî ye ya  
na.

Girtiyên reben carna di wê rewşê de qederê 5-10 deqîqeyan  
radiwestiyan

û li benda emirê dudyan ya sergaridyan dipan. Dûre emirê dudyan  
bi

dengê berz û ji xwe bawer ji alî sergardiyan dihat dayîn:

— Li xwe bikin. Bi gotina wî û lixwekirina kincan dibû yek, loma piştî  
emirê dudyan, sergardiyan dom dikir:

— Divê heta hejmara sisiyan, bi awayekî bê qusûr kincan li xwe  
bikin.

Dest bi hejmartinê dikir.

-Yeeek..Dudooooooooo û sisêêêêêêê.

Eger piştî qedandina hejmara sisiyan, hin kes dereng bimana,  
lêdana

xwe dixwarin.

Bi vî awayî girtiyan ew kincên gemarî li xwe dikirin. Piştî lixwekirina kincên emirekî din dihate dayîn »nigfer û nigcot« kesê girtî bi yek dengî

û bi yek tepe -repê ew jî pêk dianîn. Dû re sergardiyan bi dengekî hîn

berztir digot:

— Rewşa zîncîrkinê bigrin!

Bi dayîna vê fermanê, girtiyan xwe daqûl dikirin, destê xwe didan pişt

xwe û radiwestiyan. Girtî weha radiwestiyan ko em wan bi hev re, bi

zincîrên qalind girêbidin. Ji xwe yuzbaşiyê me, bi zanebûn zincîrên qalind û giran hilbijarti bû.

Me her 15 kes dikirin grûbek û ew bi yek zincîrê bi hevdu va didane girêdidan, dûre bi wî halê girêdayî, meş bi wan dikirin û sirûdên leşkerî

bi wan didan xwendin. Tam di haziriya çûyinê de pêwîst bû ko yekî serê

xwe daniya ser milê kesê pêşiya xwe ko ew ji ber xwe pêve tu dereke din

67

GARDIYAN

nebîne. Di rewşên weha de, serê xwe rakirin an jî pozê xwe kişandin qedexe bû, bi vî haletî me ew dibirin ber makîna dadgehê, ew jî hema ere-

bebûn(!), gelekî kevn û weke tabûtan bûn. Yuzbaşiyê me digot: »Divê em

makînen nû ji van heyvanan û dijminên milletê xwe re, bi kar neynin.  
Makîneyên weha ji serê wan û yên bavê van jî zêde ye. Di pêşiya wê  
de  
tenê şibakeyeke biçûk hebû. Ew şibake jî, ji alî me de dihat girtin.  
Yanî  
me xwe dida ber wê. Ew tirimbêla ji bona 5 an jî 6 kesan hatibû  
çêkirin,  
lê ji bona ko em zêde eziyet û tadê bidin wan me qederê 20-30 kes  
li wan  
makînen kevn û xerabe dikirin, bi rastî carna hîn zêdetir jî dibû. Ji  
bona  
kesekî an du kesan me nikarîbû makîneyeke din amade bikira, loma  
çend  
kes zêde jî bana me ew dixistin wê erebê.  
Piştî ko hemû hazirî dihat qedandin, me ew li tirimbêlan siwar  
dikirin,  
em qederê 6-7 gardiyanan jî bi girtiyan re li wan tirimbêlên weke  
meze-  
lan siwar dibûn, da ko ew bi hev re qise nekin, tiştan ji hev re  
nebêjin û  
fêrî agahdariyên nû nebin, eger em li gel wan siwar nebana, wan  
dikaîbûn gelek tiştên li dijî me ji hev re bigotana û dikarîbûn  
yekitiya  
xwe pêk bianiyana, ji bo ko ew ji hev haydar nebin, em diketin nav  
wan,  
di wê makîna ko ji bona çend kesan hatibû amadekirin de, him em  
li wan

siwar dihatin, him jî heta ber deriyê dadgehê me li wan didan, eger  
bi şaşî  
jî bêjeyek ji devî yekî derketa yan jî pozê xwe bikişandana, xwe tev  
bidana, lêdan dixwarin. Xwe xurandin jî ji alî me de hatibû  
qedexekirin,  
ji ber ko her dem yuzbaşiyê me digot: »Van girtiyên komunîst, van  
kesên  
bê dîn û îman, van kurtçiyên, dema xwe dilivînin, duxrînin, ew  
dikarin  
îşaretan bidin hev«, loma me evtişt hemû li wan qedexe kiribû. Her  
çiqe  
me li wan dida, her çiqe wan bi ya me jî fikir, lê dîsa her dem  
yuzbaşiyê  
me ji wan ditirsiya. Sedema vê yekê hîn jî min bi xwe fam nekiriye!  
Wan  
kesên dest û nigê wan girêdayî, wan kesên ko heroj di bin darên  
zorê de  
bûn, dîsa jî yuzbaşiyê me gelekî ji wan ditirsiya.  
Di wê makîna weke mezelekî û qedere 20-30 kesî tê de bi cîh dibûn,  
em  
di hundir de li girtiyên siwar dibûn, em rehet nedisekînin, di wir de  
jî me  
tade û îşkenceyên mezin dida wan. Li gor gotina yuzbaşî »me çiqe li  
wan  
bida, ewqasî em welatparêz dihatin hesibandin.« Ji ber vê bû ko  
lêdana  
me bê ser û ber dihat kirin. Di wê makîna ko tenê şibakeyek bi çûk  
di



pêşiya wê de hebû, ew jî ji alî me de dihat girtin. Em hildikişyan ser serê

girtiyan û me cixarên xwe pê dixist û me henek û tinazê xwe bi wan dikir,

me gazî hev dikir:

— Lo lo ez çûm qatê dudiyan, çima tu nayê mêvanderiya min?

68

## GARDIYAN

Ji me, yekî din jî weha bi ser girtiyan de diqêriya:

— Binerin pozkişandin qedexe ye, ew kî bû pozê xwe kişand?

— Ew kî ye hilma sert dide û dîstîne, ev tişt îşaretin, em dizanin, hûn weha bi hev re diaxifin.

Di rewşên weha zor de, me ew dibirin heta salona dadgehê, li wir me

zincîrên wan vedikirin, ew didan rûniştandin, ew jî ne ji bo xatirê wan

bû, ji ber ko emir weha bû, loma ew didan rûniştandin. Dema ew rû-

diniştin, bi me tade dîhat, çawa dibû ko dijminê me li hember me û bê

lêdan û îşkence weha rehet rehet rûnên, ma qet ev çêdibe? Ji ber vê bû ko

dema me ew didan rûniştandin, serê wan dixiste ber wan ko ew der û do-

ra xwe nebînin. Rûniştina wan pêwîst bû bi awayekî nîzamî ba. Kesên

berê diketin salona dadgehê weha radiwestiyan heta ko hemû hevalên

wan yên din jî bihatana dûre me ew, bi awayekê nîzamî, weke me digot,  
didan rûniştandin.

Me her yek li ser kursiya ko ji bona wan hatibû hazirkirin, dida rûniştandin. Destên wan li ser çongên wan û pêwîst bû çavê wan jî tenê li

dîwarê hember dîwarê pêşiya wan; di ser serê hakîm re weha nivîsandî bû:

»Adelet, temelê mulk e« lê bi rastî çi adelet, çi adelet... Serê xwe hejandin

çavên xwe li derên din gerandin an li hevalê xwe mêze kirin qedexe bû,

kesên weha cezayên xwe dizanîbûn...

Dema navê kesekî ji alî hakîm de bihata xwendin, pêwîst bû ko wî bi

dengekî gelekî berz bigota:

— Emir bike komutanê min.

Gelek caran hakîm, bi komûtdayina girtiyan ya weha aciz dibû. Ew emir emrekî ji alî yuzbaşiyê me de hatibû dayîn û tu kesî nikarîbûn ev bir-

yara bidana guherandin, ji ber ko yuzbaşiyê me li girtîgehê û di biryarên

wir de azad bû, tu kesî nikarîbû, têkilî karî wî bibûna.

Dema navbir ji alî hakim de dihat dayîn, gelek caran hin girtiyan digot

in:

— Komutanê min, mîza min gelekî tê, tu nemaye ko ez bi xwe de berdim, ez nema dikarin xwe bigirim, musade te hebe...Hîn wan peyva

xwe nediqendin, bersîva ko ji wan dihat dayîn tenê û bi tenê ev bû:

— Bi xwe de berde, ma tu nizanî ko li vir her tişt qedexe ye.

Dema şûnde hatinê de delîl li halê diya gelean bûn. Ji bo me jî daweteke nuh bû. Me sûcên ko wan kirine, tespît dikir an jî li sûcên wan

ko pê dihatin sûcdarkirin hay dibûn. Eger di nava wan de, kesên ko leşk-

er û polîs kuştî derketibana ne hewceye ko ez bêjim, êdî tê zanîn ko wê çî

69

GARDIYAN

bihata serê wan. Ma tenê ev, na, na, hele hele ew kesê ko bi serokatiyê bi-

hata ithamkirin, heta girtîgehê lêdan dixwar, car carna jî bi awakî ji xwe

derbasbûyî me ew dixiste hundir qawişa wî«.

Belê vegera ji dadgehê kete bîra min, bi rastî jî çûyin û hatina wê bi serê

xwe îşkenceyeke nû bû.

Em ji serê sibê hetanî piştî nîvro û car-carna jî hetanî êvarî li dadgehê,

tî, birçî, bê cixareqîşandin û îstirehetkirin diman. Derdê her tiştî dihate

kişandin lê neçûyina tuwaletê qet nedihat îdarekirin. Carna me hina  
bi  
xwe de fikir û me hina jî hetanî vegeerê xwe digirt. Eger hin hevalên  
ko bi  
îshalê (zikêş) di nava me de hebana, ya herî xerab rewşa wan bû. Di  
vî  
haletî de, dema em vedigeriyan girtîgehê, hin kesên ko hîn di bin  
xwe de  
nekiribana hebana jî, hina ji wan bi saya serê wê lêdana li ber deriyê  
qaw-  
işê, bi xwe de dikirin.  
Hevalên ko saxlem xwe digîhandin hundir qawîşê jî bi ketina me ya  
hundir û çûyina me ya çar-çar bi hevdû re ya towaletê dibû yek. Ji  
ber ko  
di qawîşa me de tenê towaletê hebû, taqeta me nema bû ko em li  
benda  
hevalê ko çûye towaletê rawestin, hema me çar bi çar qûnên xwe  
didan  
hev û pîsîtiya xwe di towaletê de berdidan. Em fêrî vê yekê jî bû  
bûn, car-  
na jî me pêkenîn li ser vê rewşê çêdikirin. Carna me tinazên xwe bi  
hev  
dikirin, me navê vê danîbû towaleta bi çar qolî.  
»Ji xwe vegeer ji bo girtiyan mirin û ji bo me gardiyanan şahiyê nê  
bû,  
di hundir wê makîne de 20–30 kes bi cih kirin bi serê xwe cefayê  
mezin

bû. Ji bo ko girtî di makînê de bi cih bibana ew mecbûr diman ko xwe bi

hevdu ve bizeliqînin, îcar ji bona em wan bê şexsiyet bikin, me digot:

— Biner, binerin bê ev çî bi hev dikin, ji xwe ji bo komunîsta her tişt serbest e.

Bi van tade û îşkenceyan me dixwestin ko ew poşmanbûnên xwe li dadgehê bêjin û hevalên xwe bidin dest, loma yuzbaşiyê me her dem ji

me re digot: »Pêwîst e ko êdî hûn lêdanê li wan kesên poşman dibin û

hevalên xwe yên mayî didin dest, nekin. Kesên weha êdî dibin, welatper-

werekî tirk.« Ji xwe mebesta lêdana çûyîn û hatina dadgehê jî yek jê ev bû

ko herkes poşmaniyên xwe bêje û hevalên xwe yên derve bidin dest, lê

yuzbaşiyê me di vir de jî bi ser neket, her çîqa çend kes bi dest xistin jî, ew

hemû ne li gor dilê wî bûn.

Ew kesên ko poşmaniya xwe li dadgehê digotin, ew bi makînen taybetî

70

GARDIYAN

û bi awayekî gelekî xweş diçûn û dihatin, ev rehetiya wan me weha ji gir-

tiyên din re digot:

— Girtîno, eger hûn jî weke wan kesên baqil û serê xwe dan şuxu-  
landin bibin. Li xwe bifikirin, hûn ê jî weha bi rehetî herin û werin.

De

êdî hûn dizanin.

Gelek caran jî me dixwest ko em nabiza girtiyan fam bikin, loma  
dema

ko navber ji alî hakîm dihat dayîn, em diketin nava girtiyan û me bi  
wan

henek û tinazên xwe dikir û bi awayekî tinazî me digot:

— Kesên ko dixwazin herin towaletê hene, eger hebin bila ew kes ji  
ci-

hê xwe rabe ser niga.

Bi vê gotinê ken bi rûyê girtiyan diket, wan bawer dikirin ko bi rastî  
jî

ew ê herin towaletê, loma jî çend kes ji cihê xwe radibûn ser niga û  
li ben-

da me radiwestiyan. Me jî ew kesên rabûne, ji nav wan kesên din  
derdix-

ist û dibirin saloneke din, li wan mêze dikir û me digot:

— Hûn dixwazin herin towaletê ha.

Hemûyan bi hev re digotin:

— Belê komandanê me.

— Ma gelo ew kesê leşker diçin towaletê?

Girtiyan mebesta me fam dikirin loma jî wan digotin:

— Na, komutanê me.

— Ê de baş e, ma çima hûn dixwazin herin?

— Me şaşî kir komandanê me.

Ew kesên ko ji bona toweletê rabûbûn, li wir me têra wan li wan didan,  
dûre me ew vedigerandin cihê wan. Çûyina towaletê weha pêk dihat. Di navberdayina dadgehê de, tiştên ko dihate serê kesên girtî, ne dihate serê wan kesên li gor me welatparêz û li gor girtiyan xwefiroş e, ji bona wan tu tiştêkî qedexikirî tune bû. Wan çî û çawa bixwestina weha dibû. Me ew ji nava girtiyan derdixistin dibirin salonê didan rûniştin, li wir zikê wan têtêr fikir, çay dida wan û piştî ko wan cixareyên xwe jî dikişandin, dûre me ew dianîn salonê, devê wan bi ken serê wan rakirîbûn. Bi vê yekê yuzbaşiyê me dixwest ko kesên çav li van bikevin, ew jî bibin mirovê wî û ew jî her tiştî bêjin.

71

GARDIYAN

IX

»Ew girtiyan wê girtîgeha bi navûdeng ya Diyarbêkrê tu carî têtêr av venedixwarin, ji ber ko me av bi zanetî nedida wan. Sedemê nedana me ya avê jî ev bû, dema ava girtiyan heba, wan xwe û hundirê qawîşên xwe

paqij dikirin. Paqijî jî ji bo wan, dermanê nedîtî bû, ji bona ew her dem

gemarî û pîs bin, av ji bo wan nedihate dayîn. Yek sedem ev bû, ya dudan

jî ew bû ko me dixwest ew her dem, tî bin da ko em karibin ji wan hina

bi saya serê tîbûnê fêdeyekê bibînin. Me baş dizanîbû tîbûn, ji birçîbûnê

zortir e. Em vê yeka hanê ji yuzbaşiyê xwe fêr bû bûn.

Me gelek caran qederê 4-5 bîdonên avê êvaran didan wan, me dizanî bû

bi êvarekê wê nikaribin wê avê hemû xilaskin, ji xwe me av piştî xwarinê

dida wan, dûre serhejmara tevayî, çûyîn û hatin, saet dibû 17.00 - 18.00.

Ji xwe pêwîst bû ew saet 19.00-an de razên. Yanî bi kurtasî ew ava ko di-

hate dayîn, heta serê sibê di haletê xwe de dima. Serê siban jî berî xwari-

na taştê me gazî qawîşên xwe dikir û digot:

— Qawîş!

— Emir bike komandanê me.

— Çiqa ava we heye, li gel pênc kesan derxin derve em ê vê salona gemarî bişon.

Tu tişteki wan bigotana tune bû, tenê wan dikarîbû bigotina:

— Tu emir bike, komandanê me.

De bifikire ko qawîşa herî biçûk 40-50 kes tê de dijiyan. Van kesan ro-



jên xwe bi qedehek an nîv qedeh av derbas dikirin, ev ji alî yuzbaşiyê me

de bi zanetî dihate kirin.

Pênc kesên girtî, li gel melkis û ew bîdonên tije av, xwe ji bo derketina

derve li ber derî amade dikirin ko heta em bihatana, me derî vekira ew jî

derketina û salon bişûştana. Şûştina salonan jî awayekî îşkencê bû, ez vê

jî ji te re bêjim, bê me çawa ew salon bi wan didan şûştin:

Dema ko me derî vedikir, ew kesên xwe ji bo derve amade kiribûn yeko

yek jimara xwe digotin û derdiketin, kesê dawî weke her dem digot pênc û

dawî. Li salonê diketin rêzê û li benda emirê me radiwestiyan û me digot:

72

GARDIYAN

— Tiştên xwe bigrin!

Bi yek dengî û yek demê de hemûyan tiştên xwe hildigirtin û digotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ji xwe armanca me, ne şûştina salonê bû, du armancên me hebûn, yek

ji bo ava wan biqede ya dudiya njî me tinazê xwe bi wan dikir.

Demên

xwe î vala bi wan re derbas dikir, dema wan tiştên xwe digirtin, digotin:

— Emirê te hate cih komutanê me.

Me digot:

— Rewşa şuştinê bigirin. Rewşa şuştinê jî weha bû, kesên melkis di destên wan de bûn, serê melkisên xwe digîhand erdê û bi awayekî daqûlkirî li benda emirekî din dipan. Ew kesên bîdonê avê di destê wan

de bûn jî, pêwîst bû wan jî him xwe daqûlbikirina û him jî bîdonê xwe,

diviyabû dilopeke av jê nehata rijandin, ji xwe mebest ew bû ko hin di

demê vê emirdayînê de xwe şaş bikin da ko em jî li wan bidin. Piştî emir-

dayin û bi cih hatinê, me weha li wan dinerî, bê hela kesekî xwe şaş kiriye

heye an na. Dema kes tuneba, îcar me digot:

— Dest bi şuştinê bikin, heta hejmartina sisiyan, divê hûn salonê biqedînin û me dest bi hejmartinê dikir, yeeek, dudooo û sisêêê.

Him me dizanî bû, ew nikarin wê salona dirêjaiya wê di ser 50 metreyî

de di dema ko me digot bişon û him jî wan dizanîbû. Lê dîsa wan bi awayekî ecele dest bi karê xwe dikirin, lê salon di dema xwe de nedihat

qedandin. Wan tenê dikarîbû dermanê şuştinê bera erdê bidin û ava xwe

jî lêbikin, ji bilî vî karî tişteki din kirin dûrî aqilan bû, îcar me zirt û fort

li wan fikir, weke wan karê xwe di demê de tamam nekirine û bi awayekî

sert bi ser wan de diqêriyan û digot:

— Razên!

Piştî vî emirdanê wan hemûyan bi yek carê û bi yek dengî xwe li ser wê

avê û dermanê şuştinê dirêj dikirin û li benda emirekî din radiwestiyan û

me digot:

— Bişon!

Wan dizanîbûn, îcar wê salonê çawa bişon, wan xwe di nava wê av û

dermanî de dibir û dianîn ko heta salon ziwa bikirana, dûre radibûn ser

xwe û digotin:

— Emirê te hate cih komutanê me.

Me weha awirekî xerab diavêt salonê û bi awakî hîn hêrstir digot:

— We ev salon baş paqij nekir, cezayê we hîn girantir bû, de îcar rewşa

lêdanê bigirin.

73

GARDIYAN

Rewşa lêdanê jî weha bû, pêwîst bû ko girtiyan destekî xwe bidana ser

yê din û li benda dora xwe radiwestiyan ko heta dor bihatayê. Ew destên

şil dema jop jî lêdiketin, ji bona me kêfeke xweş ji bona wan  
işkenceke zor

bû. Ava ko me dida wan bi vî awayî dihate qedandin».

74

GARDIYAN

X

»Ji bona em şikil û metodên lêdanê yên nuh îcat bikin, em bi hev re  
ketibûn, musabakeyekê Di dema razanê de em bêtirîn li ser tiştên  
weha

difikirîn, loma jî dê, bav, jin û zarên me, êdî nema diketin bîra me.

Loma

êdî me bi rehetî rojê metodekî lêdanê peyde dikirin. Lê ew metod  
çend

rojan tesîra xwe rê dida, pişt re girtî fêrî wê jî dibûn, êdî tesîra wê jî  
zêda

nedima. Lewra me pêwîstiya dîtina cûrên lêdanê yên nû hebûn. Ew  
awayên lêdanên kevnar êdî zêde tesîra xwe li girtiyan nedikir, îcar  
tişteki

nuh ji alî hevaleyê din ve hatibû dîtin. Ez wer bawerim ko wê tesîreke  
dûr

û dirêj li ser girtiyan hişt, ji ber me tam li hedefê xistibû. Ji bona  
girtiyan

tiştê herî girîng, têkiliyê nava wan, bi hev re axaftina wan bû, me  
dixwest

ko em vî jî ji nava wan rakin. Loma emir ji hemû qawîşan re hate  
şandin:

— Girtîno, divê ji îro pêde, di hundirê qawîşê de, axaftina du kesan bi  
hev re, yanî sohbet di nava we de qedexe be. Kesê weha wê bêne ceza-  
kirin. Ê wan baş dizanîbû ko ew ji alî me de çawa têne kontrolkirin  
û  
cezakin.

Ev yeka hanê me weha pêk dianî: Weke berê jî hatibû gotin, girtî  
her  
dem di hundirê qawîşên xwe de ji alî me de dihatin kontrolkirin, îcar  
de-  
ma me di wan qulikên, şibakên di dîwêr de li wan mêze dikir û kesên  
li  
gel hev qisedikirin bidîta, hema zû bi zû me hina hîn kontrola xwe  
dido-  
mand û gardiyanê qawîşê li gel çendên din jî, derî vedikirin û em  
dîçûn  
hînda ranzeyên wan li ser qise kiribûn, disekinîn û me gazî wan dikir:  
— Ew kesên li vir bila derkevin derve. Her kesekî dizanîbû ko ew  
kesên  
bi hev re qise kirine dernekevin wê hemû qawîş bête cezakin, ji  
bona  
hemû qawîş neyê cezakin ew kesên sûc dikirin(!) bi riza dilê xwe  
derdiketin, eger derneketina jî, piştî cezakinina qawîşê, me ew  
kesên bi  
hev re diaxifîn dibirin hucreyan û bi rojan li wir dihiştin. Gelek ji wan  
êdî

venedigeriyan qawişên xwe, loma wan zêde li ber xwe nedidan.

Dema ew

kesên li gor me sûcdar derdiketin, em jî li dû wan diçûn derve û me

de-

riyê qawişê digirt. Dûre em, ew gardiyanên salonê li ser serê wan

di-

civiyan û me digot:

— De ka bêjin, we çî plana revê çêdikir, we çî haziriya serîhildana  
dikirin, de ka zû bêjin.

75

GARDIYAN

Ew tiştê me bi xwe digot, em pê nebawerbûn, tu kesekî ko  
bikaribûna

ji wê girtîgehê birevin tune bû, ew girtîgeh weha hatibû çêkirin ko  
ne

mumkun bû kesek bikaribe xwe ji wir azad bike. Lê ji bona em çavên  
wan

bitirsînin û ji bona ew bi hev re qise nekin, me ev yeka hanê dikir û  
dig-

ot, hevalekî me yê din jî beşdarî nava axaftina dibû û digot:

— De ka zû û rast bêjin, yan na em ê we têxin nava du metre  
paçikên

sipî û bişînin malê.

Gotina girtiyan pere nedikir, ji xwe wan çî bigotana, me bawer  
nedikir

û lêdana xwe dikir, me gelek caran digot: »kuro te çî digot, eger tu  
nebê-

je ez dizanim«. Bi xêra van axaftinên me gelekên tirsok diketin feqa  
me û  
dibûn zilamên me, dibûn, muxbîrên me, bi saya serên kesên weha  
ew  
tiştên di qawişê de dihat axaftin, em jê haydar dibûn.  
Gelek caran me ne dikarîbû ew kontrol bikirana, ji bona vê pêwîst  
bû,  
ko em li ber şibakan bisekinin û li girtiyan mêze bikin. Ev jî ne karekî  
hêsan bû. Loma êdî ji bo rehetiya xwe me, piştî taştê û serhejmara  
giştî,  
hin qawiş derdixist derve li wir meş û sirûdên leşkerî bi wan didan  
kirin  
û xwendin, lê yên di hundir de diman, pêwîst bû ko ew jî têketina  
sek-  
inandina nîzamî û heta xwarina nîvro, ya ew pirtûka ko ji 102  
rûpelan ya  
»Ataturk îlke ve «nkilaplari» bixwendana yan jî di cihê xwe de meşa  
di cih  
de bikirana û sirûdên leşkerî bixwendina. Bi vî awayî bi hindikayî be  
jî,  
me têtikiliyên nava wan kêr dikir. Di rewşên weha de çûyuna  
toweletê û  
vexwarina avê li gor destûra berpirsiyê wan yê ko ji alî me de  
hatibûn  
hilbijartin, dihate kirin.  
Xwendina wê pirtûkê jî weha dihat kirin: Kesek ji girtiyan dihate  
orta

kesên din li ser niga û nîzamî disekinîn. Berê yê li ortê rawestiyayî  
bi  
dengê gelekî berz dixwend û yên din li wî vedigerandin. Ev hal  
heta  
navrojê didomand, berî ko em firavînê bidin wan, me dengê wan  
girtiyên  
yeko yeko kontrol dikir û kesê ko dengê wî neketiba, delîl li halê  
diya wî  
jî bû. Ji xwe ew kesên ko dengê wan ketibûn, rewşa wan hîn xirabtir  
dibûn, qirik û gewrî li wan perçe dibû.  
Bi saya serê wan şibakên di dîwarên qawîşan de, me bi awayekî  
rehet  
dikaîbû girtî bidîtana, ew kontrol bikirina, lê wan nikaîbûn em  
bidî-  
tana. Loma jî her gav ew di bin kontrola me de bûn, wan ne  
dizanîbûn  
ko em çi demê, li wan dinerîn. Loma bi piranî daxwazên me pêk  
dihatin.  
Eger ne bi tevayî be jî me ew têkiliya nava wan kêr kiribû».

76

GARDIYAN

XI

»Roj bi roj şikil û metodên îşkenceyan zêde dibûn, Girtiyên bi xwe  
nema  
dizanîbûn, êdî çiyê bête serê wan. Loma wan nema dikaîbûn, li  
hember  
îşkence û metodên nû, xwe hazir bikirana, çi bihata pêşya wan ew



mecbûrî bi wê razî dibûn. Hingî metod û şiklê işkencan peyde  
dikirin,  
em bi xwe jî aciz bû bûn, êdî em û yuzbaşiyê xwe gîhêştibûn wê  
baweriyê  
ko kesên girtî bi darê zorê teslîm nabin. Tenê tişteke di destê me de  
mabû,  
ew jî ev bû ko em bikaribin bi darê zorê ji nava wan hin alîkarên xwe  
çêbikin û bi saya serê wan em kesên ko hîn li dij me yan jî kesên li  
dijî  
girtîgehê qise dikin, yan jî morala berxwedanê didin hevalên xwe  
tespît  
bikin, da ko em êdî li ser kesên weha rawestin. Ji ber vê bû ko êdî  
me ji  
bilî hin caran lêdana tevayî rakiribû, her roj me hin kes ji qawîşê  
derdix-  
istin û lêdan li wan dikir ko em rewşa wan û cesareta wan î li  
hemberî lê-  
danê fêr bibin û pirsên li gor xwe ji wan bipirsin. Ev bû bû karê me  
yê ro-  
jane, bi dor me hin kes derdixistin derve û pirs ji wan dikir, ko bê  
rewşa  
kesên lêdan li wan dihate kirin çawan ne? Ew ê bikaribin xwe li ber  
lêdanê  
rabigrin an na. Bi vê metodê, me gelek kes kirin alîkarên xwe. Bi vê  
metodê êdî mirovên me, alîkarin me di qawîşan de peyda dibûn, bi  
saya  
serê wan êdî me ew kesên hîn nehatibûn rê û li dijî me qisedikirin,  
derdixistin derve û işkence bi wan dikirin û ji wan re digot:

— Biner e, kurê min, derketin an jî mayîna te î li vir girêdayî rewşa  
te  
ye. Yuzbaşiyê me dikare kesan berde û bigire, eger tu daxwazên me  
bîne  
cih, tu dikarî di demekê kurt de ji vir azad be. Sucê te çi dibe bila  
bibe,  
berdan an jî mayîna te di destê yuzbaşî de ye. Dema em ji wî re bêjin  
ko  
tu alîkariya me dike, wê ji îro pê de tu lêdan li te nebe. Karê te wê  
tenê di  
hundirê qawîşê de be. Tê guhdariya axaftina şexsan bike, bê ka ji  
hev re  
çi dibêjin. Eger hin kes li dijî me qise bikin, tê navên kesên weha bi  
dizî  
bide me û pêwîst e ko girtiyên din ji rewşa te agahdar nebin. Em ê  
hewl  
bidin ko tu kes bi vê rewşa te nizanibin. Ji du rojan carakê em ê banî  
te  
bikin û te derxin derve, tê jî her tiştî ji me re bêje û dema vegeerê tê  
bike  
axî nê ofîn weke ko me gelekî lêdan li te kiribe. Ji girtiyan re bêje

77

GARDIYAN

»gardiyan ji bo lêdanê bangî min kir« bi vî awayî him tê ji lêdanê  
xilas be,  
him jî tê zû ji vir bête berdan. Lê, eger tu tiştên rast nebêjî, tiştên  
ko wê

werin serê te jî divê tu pê bizanibe. Bi vî awayî me hin kes bi dest xistin,  
hin kes jî qet nehatin rê, qasî ko me lêdaneke zor û giran li wan dikirin,  
dîsa kesên weha tu tişt ji me re nedigotin.  
Ew kesên bûn alîkarên me, ne ji wan kesên kurtçî û komunist bûn.  
Ji  
xwe hinên din di qawişan de hebûn ko ew bi xwe dijminê komunist û  
kurtçîyan bûn, kesên weha dema dîtin, em xweditiyê li wan dikin, gelek  
ji wan bi xwe hatin û digotin : »Ez dixwazim bi her awayî alîkariya we  
bikim« erê me ew guhdarî dikirin, lê rûmeta kesên weha zêde tune bû,  
dema karê yuzbaşî bi wan diqediya, êdî wî jî guh nedida wan.  
Mirovên muxbîr zû dihatin deşifrekirin, me nema dizanîbû ko çima ew  
weha zû deşifre dibûn. Em weha têgihiştin, ko mirov nikare di nava kesên zana de, li dijî wan, demeke dûr û dirêj kar bike. Dema wan zilamê  
xwe yên muxbîr nasdikirin, nikarîbûn tişteki bi wî bikirana, ji ber wan  
dizanî bû ko ew kes ji alî me de têne parastin.  
Heta ez bi xwe li wê girtîgehê gardiyan bûm, min nedît ko rojekê ji ro-  
jan wan kesên girtî tê av vexwarin û xwarin xwarin, ji bilî wan kesên alîkariya me dikirin, yên din hemû tî û birçî bûn. Ew kesên girtî yên

alîkariya me dikirin, rewşa wan gelekî baş bûn, lê wan kesên ko di  
berxwe  
didan, rewşa wan jî gelek xerab bûn. Ji bilî van, girtiyên din hemû  
kêm  
zêde, mirov dikare bêje wek hev bûn. Ji bona wan serşûştin,  
kincşûştin  
hatibû jibîrkin, me cihê xweşûştinê yanî ew hemama ko ji bo wan,  
hat-  
ibû çêkirin, kiribû cihê îşkencê.  
Tenê dema hin heyet ji Ewropa, an hin kesên ko digotin em mafên  
mirova diparêzin dihatin girtîgehê, wê demê him hemam vedibû,  
him  
xwarineke xweş ji girtiyan re dihate çêkirin û belavkirin, ew jî tenê  
ji bona  
rojekê bû ko ew kesên ji Ewropa dihatin, rewşa girtîgehê baş  
bibînin. Lê  
piştî çûyina wan, me him heqê xweşûştinê û him jî heqê xwarina  
xweş ji  
bêvila wan derdixist.  
Niha jî ez dixwazim li ser rewşên weha, ji te re çend mînakekê  
bidim.  
Dema di medya tirkiye de, di derheqê girtîgeha Diyarbkerê bi  
awayekê  
negatif propaganda dihat kirin, wê demê yuzbaşiyê me ji bona ko  
wan  
tiştan, bi awayekê nerast bide diyarkirin wî Televizyon dawetî  
girtîgehê

dikir, hemû filmên girtiyan yên li gor dilê xwe me dida kişandin û li hem-

ber wan ew didan weşandin. Roja wê Televizyon bihata, wê rojê me hemama girtîgehê dixiste halê xweşûştinê, û dibû xuşe xuşe ava germ û

78

GARDIYAN

sar, te digot belkî ev hemama tucarî nebûye cihê lêdan û îşkencan.

Piştî

me hemam hazir dikir, berê televizyon dibir wir. Ew hemama, ava germ

û sar jê dihat, rê wan dida û wan jî fîlm dikişandin. Dûre me çend qawiş

dixiste rêzê ko werin serê xwe bişon, me girtî li qawişên wan tazî dikirin,

tenê li ser wan derpê dihişt û taseke hamamê dixiste destekî wan û destê

din jî de xewliyên wan û bi terlikan me ew ji qawişên wan derxistin, di sa-

lona mezin nîşanî dibirin hemamê, televizyonciyên me jî filmê wan dik-

işandin. Fîlmkêş dîçûn hêleke din. Dema ew diçûn me jî weke her tim

dest bi hejmartinê dikir. Yeeek...diidooo...sisêêê, ji xwe kesî nikarîbû xwe

di demeke ewqas kurt de bişûsta. Me jî nedixwest ko ew serên xwe bişon.

Bi vî awayî, him me li hember medyaTirkiyê û hin caran, jî li hember  
raya gişti ya dinyayê rûyê xwe spî fikir(!)...«

79

GARDIYAN

XII

»Di gelek rojên bîranîn û cejnên neteweyî yên me tirkan de, me  
tiştên

ecêp dianî serên girtiyên wê girtîgehê. Ji bîranînên wan rojan yek jî  
bi

taybetî, roja 12 îlonê bû. Ew roj, dibû roja lêdan û işkenca girtîgehê  
bi

tevayî. Ji xwe me gelek caran dîtinên lêdanê, metodên nuh di rojên  
12

îlonê de bi kar dianîn. Di wê roja pîroz de pêwîst bû ko me hin girtî,  
se-

qet bikirana û gelek caran jî ji bo vê roja hêjayî bîranînê de me hin  
qur-

ban jî ji bona wê dida. Hatina wê rojê di rûçikên wan kesên girtî, yên  
ko-

munîst û kurtçiyên de bû, loma jî divê me kesekî an hin kes anji bona  
wê

rojê pîroz bikirana qurban.

Serê sibana dema me ew xwarina, ji nîv qedeh çay, an jî ji nîv tas  
şorbe

didan wan, bi dayînê re me digot:

— «roja 12 îlonê ye, pêwîst e ko hin ji we di nava du metre paçê sipî  
de

herin malê. Mana vê ew bû ko diviya bû hin bihatana kuştin. Ne ko me

ev ji ber xwe digot, serê sibê, dema em diketin kombûnê, yuzbaşiyê me

Esat Yildirim, digot:

— Hevalno weke hûn dizanin, îro roja 12 îlonê ye, ev roj ji bo her we-

latparêzê tirk rojêke pîroz e. Eger ev roja nehatiba, belkî niha ji me gelek

tunebana, belkî welatê me biba du perçe, ew kesên wê ev bikrana jî, ji

wan hinek niha di vir de girtî ne. Pêwîst e ko zikê we bi wan neşewite,

eger ev îmkanên di destê we de, di destê wan de ba, wê hûn hemû di na-

va yek saniyê de bidana ber gulan, lê em weha nakin. Em wan nakujin.

Xwarinê didin wan, avê didin wan û em wan xwedî dikin. Lê ji bona xatirê vê roja ko welatê me ji destê wan hatiye azadkirin divê hûn jî weha

li wan bidin ko heta taliya emrê xwe ew jî vê rojê di bîra xwe de bihêlin

ûwh.

Me rebenê xwedê tu tişt nedizanî bû, piraniya me, em rastî û çepitîyê li vir fêr bû bûn, me geleskan navê kurtçitîyê li vir bihîst. Em gelekî

di bin tesîra yuzbaşî de diman. Wî di gelek axaftinên xwe de weha propaganda li dijî girtiyan dikir ko girtî li ber çavên me kiribûn di-

jminê herî mezin. Eger wî destûra me bida me yê ew hemû di vir de  
80

## GARDIYAN

bikuştina, lê wî her dem digot:

— Na, hevalno na, divê em wan nekujin, em ê wan xwedî bikin, em  
ê

wan bînin rê, bila ew baş bizanibin ko milletê tirk li gel ordiya xwe  
çiq a bi

merhamet û însaf e ko dijminê xwe nakuje.

Di bin tesîra axaftina yuzbaşî de, li me weha dihat ko em bê mejî û  
heş

dibûn, dema yuzbaşî têdigîhişt ko em bi wan axaftinên wî gelekî  
mutesîr

dibûn dûre digot:

— De îro roj roja we ye, ez we bibînin hevalno, ev roja roja xêrê ye.  
Ev

roj roja xelasbûna gelê me, ji destê komunîst û kurtçiya ye. De siba  
we bi

xêr.

Em jî weke gurê har, her yek ber bi qawişa xwe de direviyan, nêzîkî  
li

qawişê dikir û diqêriyan.

— Qawiş! xwe ji bona derve hazir bikin. Wan bi yek dengî digotin:

— Tu emir bike komutanê me.

Ez wer bawer im ko wan jî dizanîbû, di vê rojê de wê hin ji wan, ya  
wê



herin nexweşxanê yan jî wê di nava du metro paçê sipî de herin  
malîn

xwe.

Ji bona du qawişan tenê cihekî me û kombûnê hebû, kîjan qawiş  
berê

derketa ya din jî li hundir weke yê derve meşa di cih de dikirin û  
sirûdê

leşkerî dixwendin heta ko dora wan î derketina derve bihata.

Qawişa ko ewil, derdiket derve, li wir me berê meşê, xwendina  
sirûdê

leşkerî bi wan fikir, li dû vê jî em bi daran diketin nava wan ko weke  
mirov dikeve nava naxira dewaran. Ji xwe ji bo me ferqa wan û  
heywanan

ji hev tune bû, heta yuzbaşiyê me digot: »heywan ji van kesên di vir  
de ne

baştir û bifêdetir in« loma jî em di rojên weha de qet, ne difikirîn,  
ev çav

e, ev poz an jî serî yê. Ev jin ev ciwan, ev seqet an jî kal e, kî çawa  
dikete

ber darên me, me weha li wan dixist. Loma gelek kes diketin û  
raned-

ibûn, me ew dişandin malên wan û gelek kes ji wan dişandin  
nexweşx-

aneyaya ko ji wê girtîgehê zortir bû. Lêdana me berdewam dikir ko  
heta ke-

sek bihata kuştin an jî me bizaniya va ye yek ket û êdî ew ê bimre,  
dû re

me dev ji wan berdida«.

Rojek ji rojên 12 îlonê bû, gardiyanê me em derxistibûn derve ko meşê bi me bidin kirin û sirûdan bidin xwendin. Di dema meş û xwendina sirûdan de me ji destê gardiyanê xwe gelekî lêdan dixwarin, ji ber ko ew roj roja 12 îlonê bû, pêwîst bû, her tiştên wê rojê bi awayekî taybetî bihatana çêkirin. Di nava wê meşê û lêdanê de hevarekî nigê xwe berî me avêt pêş

81

## GARDIYAN

û gardiyan dît. Wî em dane sekinandin û li ber wî hevalê sekinê û heta jê

hat, kulmek li wî da, ew ket û xwîn ji dev û pozê wî hat, ket û ranebû, gardiyan û me got belkî mir. Loma jî piştî ketina wî, gardiyan em dane

sekinandin û got:

— Qawiş rahêlin cenazê xwe û herin hundir heta ez werim.

Wî em xistin hundir û çû, em weha tê ghiştin, ew ê mizgîniyê bide yuzbaşiyê xwe ko ew jî xelatekê bigire. Piştî qederekê ew bi kêf û bi baz-

dan li gel çend garidyanên din li qawişê vegeriya, derî vekir keniya û got:

— Mesûl ka wî kesê mirî bîne.

Hevalê mesûl li wî vegerand û got:

— Komandanê min ew kes ne mir, wî niha çavên xwe vekirin.

Bi xelaskirina gotara hevalê mesûl, rûçikê gardiyan tirsê û tal bû, sor  
û

zer bû, deriyê qawişê girt û di ber xwe de got:

— Naxwe ew ne mir ha, ne mir ha, ne mir ha!

Gelekî hêrs bû bû, ji ber ko dema ew kesê girtî nemira wê yuzbaşî  
tu xe-

lat neda wî, loma hêrs bû û bi zirt got:

— Têkevîn rêzê ez ê qasî du-sê deqîqên din verim.

Wî derî girt û çû, di vegeerê de li gel çend gardiyanên din li me  
vegeriya

û got:

— Divê ez jî îro yekî ji we bikim qurbana vê roja delal.

Piştî qederekê, li gel çend gardiyanên din, bi hêrs deriyê qawişê  
vekir û

ketin hundir, li dora me çûn û hatin, dibû nuçe-nuça gardiyanê me,  
bû

kufe kufa wî, difikirî ko ji dilva xelatê dibe ko yuzbaşî, wî bişîne cihê  
wî

yê ecemîtiyê, weha jê dihate famkirin ko tirsê wî ya herî giran ev  
bû, bi vê

tirsê ew di ser me de qêriya:

— Nabe, nabe, divê îro ji we yek di nava pênc metre paçê sipî de  
here

mal. Eger yek ji we nere yuzbaşî wê min ji dilva we bişîne malê.

Bi vê tirsê û xofê, wî darê xwe rakir û dest bi lêdana me kir, bû axîn  
û

waxîna me, bû qêrîn û warîna me, carna hin ji me diketin erdê, dîsa

radibûn, serê çend kesan jî me hate şikandin, heta emirê yuzbaşî  
hat û  
gotibû, »min ew azad kir, îro têra me kes ketine, hin mirine û hin jî  
li ber  
mirinê ne«.

Belê her çiqa nava wan û yuzbaşî xweş bû jî lê dîsa ew gelekî ji wî  
ditir-

siyan. Dema wan jî şaşitî bikirana, an jî tişteki ne li gor yuzbaşî  
bihata

dîtin , rewşa wan wê ne kêmi ya me ba. Her çiqa ew hatibû azadkirin  
jî

diviyabû li hember qenciya yuzbaşiyê xwe tişteki bikira ko ew jî  
kêfxweş

biba, loma hema wî çavê xwe li nava me gerand, wî bi destê  
hevaleki me

82

## GARDIYAN

girt, ji nava me derxist bire derve. Piştî derketina gardiyan û heval,  
dengê

joba dihat ko ew li wî didin, qederekê weha dom kir dûre  
bêdengiyek

çêbû, piştî wê bêdengiyê qêrîneke gelek berz ji heval hat, çer bû, çi  
bû me

nema dizanî bû. Deriyê qawişê hate vekirin heval ji navê û berjêrtir  
tazî

bû, dema ew ketin hundir gardiyan bi awayekî devliken ji heval re  
got:

— De ka bêje, min li derve çî anî serê te, yeko yek bêje, bila hevelên te

jî bi rewşa te bizanibin.

Heval dest bi axaftinê kir, ji xwe wî tiştên ko gardiyan anîbû serî nego-

ta, rewşa wî dikarîbû hîn xerabtir biba, ew dikarîbû di nava du metre

paçên sibî de biçûya malê jî, loma heval got:

— Komutanê min ez derxistim derve, li wir berê li min xist, dûre got: »Jina te heye« min got: »belê« wî got:«Ez bi... jina te«Min got: »di oxire

te de ye.«Wî got, »diya te heye«min got: »belê« wî got«Ez di diya te

jî.....«min got »di emirê te de ye.«Piştî van xeberdanan, wî bi alîkariya

hevalê xwe pantolonê min ji min kirin, serê min berbi jêr û qûna min

berbi jor hildan û job rada min, dûre ew jobê bi gû, min bi zimanê xwe

dalast.

Dûre heval li gardiyan nerî û got:

— Emirê te hate cih komandanê min.

Piştî wê bobeleta gardiyan anîbû serê wî, him gardiyan hebekî rehet bû

bû, û him jî yuzbaşiyê wî dema ko ev bûyer bihîst kêfa wî jî hatibû, loma

gardiyan êdî ne deyndarê yuzbaşî bû...

## GARDIYAN

### XIII

»Ji du mehan carekê, ji alî sawcî de kaxizeke ko sûcê girtiyan tê de nivîsandî dihate girtêgehê û di demên hatina wan kaxezan de, me lê-

daneke rind û qenc li wan fikir. Ji ber ko tu xwendina me kesî ewqas tune

bû, ko em bikaribin tiştan ji hev derxin. An jî bizanibin ko ew kaxez ji bo

çi ye. Tenê tiştê ko me pê dizanîbû, qasî ko me karîbû bixwenda, ew bû

ko me li gor sûcê li wir nivîsî qîmeta wan baş dizani bû(!). Di demên hati-

na wan kaxizan de me kêf li ser serê girtiyan fikir. Me berê kaxieên kesên

sûcê wan sivik belav dikirin. Dûre dor dihate wan kesên ko bi kuştina

leşker û polîsan dihatin sûcdarkirin, an jî ew kesên ko rêxistin damezi-

randine, li gel çend gardiyanan kaxezên wan li wan dihate belavkirin.

Me ew şibaka di deriyê qawişê de vedikir û banî wan kesên weha fikir

û digot:

— Filankes. Wî jî di hundir qawişê de bersiv dida û digot:

— Emir bike komutanê min.

— Derkeve derve!

— Tu emir bike komutanê min.

Wî hîn nedizanîbû ko wê çî felek bête serî, dema derdiket, dinerî ko em

4-5 gardiyan li benda wî ne, wê demê ew tê digihişt ko rewş ne baş e.

Loma wî dixwest ko hertiştê xwe bi baştirîn, nîzamî bike ko bi awayekî

rehet azad bibe, lê tu xelasbûna wî tune bû. Dema ji derî derdiket bi

dengekî bilind digot:

— Yek û dawî komutanê min.

Bi derketina wî re hema me êrîş dibir ser wî, yek li vî alî, yek li wî alî, dar û jop weke baranê bi ser serê wî de dihat. Rebeno nema dizanîbû ko

wî çî kiriye. Piştî lêdaneke bi dilê me, îcar, gardiyanê qawişa jê dipirsî:

— De ka bêje, bê te di jiyana xwe ya sivîltiyê de çend leşker an polîs kuştine û daye kuştin?

Ji xwe wî çî bigota me bawer nedikir, ji ber ko kaxeza ji alî sawcî ve ko

sûcê wî tê de nivîsandîbû, di destê me de bû, li wir ya sûcê wî »rêxistinek

bi çek damezrandiye« ya jî »wî li gel polîs û leşkeran şerê çekdarî kiriye û

84

GARDIYAN

di wî şerî de hin şehît ketine. Vê yeka hanê têra me dikir ko em wî  
bidin  
ber dar û joban. Qasî ko em tê ghiştin polîs, leşker, sawcî an jî her  
kesekî  
karmendekî dewletê tu carî derewan nakin, yên derewçîn ev kesên  
girtî  
ne. Bi vê bîr û baweriyê, me ji tu tiştên girtiyan bawer nedikir, eger  
wan  
rast jî bigotana. Carna girtiyan digot in ko »Komandanê min, ew  
tiştê li  
ser wê hatiye nivîsîn, tenê îdîayek e, dibe ko ev li dadgehê bête  
rastkirin.  
Ew tiştên ko hatine nivîsîn, ne min kiriye û ne ez dikarim bikim.  
Kesek,  
hatiye girtin, di işkencê de tehemul nekiriye û gelek tiştên ne rast  
him xis-  
tiye hustiyê xwe û him jî xistiyê hustiyê hevalên xwe. Hûn ê jî bibînin  
ko  
di dadgehê de gelek kesên ji sûcê giran tene îthamkirin wê bêne  
berdan«.

Dema wî axaftina xwe diqedand, ken bi ber rûyê me diket, ko ew çî  
xweşik dereweyên xwe bi cîh dike, loma em jî fêr bû bûn ko ji wan  
re  
bêjin:

— Ji xwe hûn hemû bê sûc û bê guneh in, hûn bi şaşî hatine vir. Ew  
kesên sûcdar, em gardiyan bi xwe ne(!)

Dema wî axaftina xwe diqedand, wan gardiyanên din ko xwe dabûn



benda qedandina gotara wî, weke xwe dabûn benda nêçîrê, hema me bi

job û darên xwe dest bi lêdanê fikir. Carna jî di navbera wê lêdanê de

yekî ji me weha digot:

— De zû bêje, sûcê te çi ye? Te çend kes kuştine an jî daye kuştin?

Di nava dar û jobên me de dibû qêrîn û warîna wî, gazî fikir digot :

— Wele tu sûcê min tune ye, ev îftîra ye!

Ma kê bawer fikir, lêdana wî dom fikir heta ko me çend dar di canê wî

de bida şikandin. Şikandina daran di canê wan de dihat wê manê ko ew

kes wê çend rojekî di nava nivînan de razê.

Ma kê ji wan gotarê wî bawer fikir, baweriya me qet bi wan tune bû, lê

bi rastî ji gelek tiştên wan digotin rast derdiket. Di dadgehê de min bi xwe

jî dît ko ji wan kesên bi sûcên giran dihatin îthamkirin hin ji wan, hatin

berdan«.

Dema wî, ev tiştên ecep digot ew bûyerên ko ez bi xwe di nav de jiyabûm,

yeko yek dihatin ber çavên min.

Rojekê ji wan rojên lêdanê bû ko hate serê min jî, ji ber ko ew kaxeza

min ya ko ji alî sawcî ve dihat, sûcê min tê de weha dihate lêkirin.

»Rêxistineke çekdarî ava kiriye û karûbarê navendî daye meşandin«  
ev

gotar têra gardiyana dikirin. Ji bona lêdanê ev yeka têr dikir û zêde bû jî.

Rojeke ji wan rojên felekê bû ko kaxeza min ji alî sawcî de hatibû

85

GARDIYAN

şandin. Garidyanê me kaxeza min di dest wî de û çend gardiyanên din jî

dabûn dor xwe û bi awayekî bi kêf deriyê qawişê vekir û qêriya:

— Sîdar!

— Emir bike komutanê min.

— Zû derkeve derve, em ê îfade te bigirin.

Dema wî behsa îfadegirtina min kir, ez gelekî tirsiyam, ji ber ko îfade girtina girtîgehê ne weha rehet bû, ya diviya bû em hertiştî weke yuzbaşî

dixwest bêjin, yan jî mirov dihate kuştin.

Ez bi bazdan derketim derve, bi derketina derve ez çî bi bînim, ne tenê

gardiyanê me li derve bû, li gel wî çendên din jî hebûn. Di destên hina de

jop û di yên hinekan ji wan jî kalas hebûn. Dema çavên li wan ketin, tirsekê ez girtim, ji tirsê, min komûta xwe ya nîzamî bi dengê berz da:

»Sîdar Mêrdîn, di emirê te de hazirim komutanê min« wî bi awirekî tûj li

min nerî û got:

— Sûcê te çî ye?

— Ez bê sûc im, komutanê min!

Keniya û domand:

— Niha tu bê sûc î?

— Belê komandanê min.

— De rast bêje, te heta roja îro çend kes dane kuştin an te bi xwe kuştine?

— Wele komutanê min, min ne tu kes kuştîye û ne jî daye kûştinê. Tiştên weha ji min nayê, ez, bê sûc im.

— Niha tu bê sûc î?

— Belê komutanê min.

— Ji xwe ev kesên li vir hemû bê sûc in, yê sucdar em gardiyan in.

— Na, heşa komutanê min.

Weha xuya bû ko ew ji bersîvên min aciz bû bû loma bi hêrs li min zîvirî û got:

— De baş e, ka em binerin. Li hevalên xwe nihêrt çav da wan û êdî min

nema zanî bû ko derb ji ko tîn, te digot qey wan, dahn xistiye (cûnî)qafivik û bi mîrkutan dikutin, yekî radikir yê din lêdida betilandi-

na wan, min ji bêhnvedana wan fam kir. Gava lêdana xwe dan rawes-

tandin gardiyanê me dîsa li min mêze kir û pirsî:

— De ka bêje, te çi kiriye? Rastiye ji me re bêje ko em te bişînin qawîşê.

Bersîva min yek bû.

— Wele û bile, komandanê min ez bê sûc im.

86

GARDIYAN

Ew baş tê ghiştin ko ez ji bilî vê tu tişteki din nabêjim, loma gardiyanê

me gazî hevalê berpirsiyarê qawişa me kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Zû benekî bîne û derkeve der.

Min bi xwe ewilî tu mane neda ko ew ji bona çi ben dixwaze, lê dema

ko hevalê mesûl derket û ben di destê wî de bû, gardiyan weha li min

mêze kir û bi hêrs pirsî, êdî diyar bû ko ew dixwaze çi bike;:

— Tu zewicî ye?

— Belê, komandanê min.

— De baş e, eger tu rastî ji me re nebêje, ez ê weha li te bikim ko êdî tê

nikaribî herî cem jina xwe, ez ê te ji mêranî de bixim.

— Tu emir bike komutanê min.

— De ka bêje, sûcê te çi ye?

— Wele û bileh, tu sûcê min tune ye, komutanê min.

Ew hîn bêtir hêrs bû û gazî hevalê mesûl kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

Gardiyan bi awayekî ji xwe bawer û bi kêf bû, ji xwe her dem wan li ser

serê me kêfa xwe dikirin. Weha xuya bû îro wê kêfeke hîn cûda bikirana.

Dibû ko wan tiştêkî nû peyda kiribûn, yanî îcateke nû. Wî dîsa li mesûlê

me mêze kir û got:

— Vî benî, bi awayekî qasidî, bi kîrê (mêraniya) vî kurê kerê ve girêbide. Û gardiyan li min mêze kir û got:

— Zû pantorê xwe derxe!

Min ew emirê wî pêk anî û da destê hevalê mesûl, lê wî jî bi awayekî gelekî qasidî girêda û ji gardiyan re got:

— Emirê te hate cih komutanî min.

Gardiyan berê li rewşa min nihêrt, çavên xwe xiste nava çavên min û

got:

— Sûcê te çi ye? Bersivdayina min weke berê bû, ji hevalê mesûl re got:

— Mesûl, ben bigre destê xwe û bikşîne ko heta ez bibêjim bes e.

Ji xwe ji vir pêde ne hewceye ko ez bêjim, tiştê ko hate serê min divê

meriv texmîn bike.

Ez û ew hevalê berpirsiyarê qawişa me, em ji yek rêxistinê bûn. Lê wî jî

mecbûrî, ew emirê gardiyan bi cih anî, ya na, him mesûl û him jî min ê

lêdaneke teybetî bidîtana û taliya talî wê daxwaza gardiyan jî pêk bihata.

87

GARDIYAN

Ji ber vê yekê bû ko em berê di nava xwe de axivîbûn ko di rewşê weha de  
divê bi ya gardiyan bikin ko hevalên din lêdanê nexwin. Ji xwe çawan ba  
wê yekî ji me lêdan bixwara.  
Piştî qedandina karê xwe gardiyan çûn, em jî ketin hundir, heval li dor  
me çûn û hatin, halê me pirsîn, hina got:  
— Ma çi bi we kirin.  
Min bi henekî got ku:  
— Wele wan tiştek nekir, lê vî camêrî -min hevalê berpirsiyar nîşan kir-  
agir bera nava min da, yê îşkence bi min kir, ev bi xwe bû, gardiyan ji wî  
re got, girêde, lê wî weha girêda ko ji gardiyan xerabtir kir, lê ya baş ew ko  
min jî xiste destê wî. Hevalan êdî rewş fam kirin, loma bi halê min û hevalê mesûl kenyan.  
Gardiyan axaftina xwe didomand.  
»Weke berê jî min gotibû ko me şev û rojên xwe ji bo ko em metodekî  
nû yê îşkencê îcat bikin, şiklekî taze bibînin, dibuhurand. Lê tu demê jî  
ew fikirinadinên me vala nediçûn, her û her me rojê metodekî îşkencê  
didît, rojê babetekî lêdanê me li ser girtiyan diceriband.  
<car me îcateke nû û gelekî modern(!) peyda kiribû. Bêyî ko em zêde

zehmetê bixwin, bêyî ko dereke girtiyan ji lêdanê reş bibe, an jî  
bişkê û  
bêyî ko qêrîn çibibe, me ew şikil dixiste pratîkê. Çi bû ev, çi bû ev  
şiklê  
işkenca nû, çi bû ev metodê delal. Ew mûmên ko 10-15 cm. dirêj û  
me bi  
girtiyan didan xwarin bû. Te digot belkî xiyar e ko em didin destên  
wan.  
Dema me ew dixiste devê wan û dest bi cûtina wê dikirin ko wê  
bixwin,  
cûtin û tama wê gelekî zahmet bû, loma di dema cûtinê de wan  
çavê xwe  
digirtin, dema çavgirtina wan de me weha digot:  
— Kurê kerê, ma qey xiyarê te tal e. Çima tu çavên xwe digire, ma  
tu  
nizane ko cezayê çavgirtinê, nîv mûma din e ûwh.  
Ew girtiyê mûm dixwar, heta demekê dilê wî diçûdihat, serî lê gêj  
dibû,  
her serê pênc deqîqan carekê direviya towaletê li wir verdişiya.  
Dema  
verşiyê me digot belkî aniha wê dil û kezaba merivan di devê  
merivan de  
were. Wan kesên mûm dixwarin qederê hefteyekê him nexweş  
diketin û  
him jî wan nikarîbûn xwarin bixwarana. Tiştê herî xerab ew bû ko di  
demên meşê de, xwarin û vexwarina mûm, dermanê kincşûştinê an  
jî

murekebê bû. Ji ber ko ew kesên ev nîmet(!) dibû qismetê wan, bi emel (îshal) jî diketin, kesên bi emel nikarî bûn bi seatan li der ve meş bikirana, gardiyan jî ew ne dibirin towaletê, gelek caran kesên weha di bin xwe de berdidan.

88

## GARDIYAN

Belê ev babetekî nû bû, ma tenê ev, na, na em bi vê tenê nedihatîn ser, biner e ez ji te re vê jî salix bidim:  
— Carna em hin gardiyan li salona sînemayê, an jî li salonên din diciviyan, li wir me masayek, hin kursî datanîn çend sûretê orosipiyan jî li dîwêr dixist, muzîkek jî dida ser, te digot qey meriv li meyxanê ye. Dûre me çend gardiyan jî dişandin pê wan kesên sûcê wan giran, yan jî ew kesên ko di wê kaxeza ji alî sawcî ve ji wan re diçû ko di wir de sûcê giran tê de dihat nivîsandin, dikir. Ev hevalê gardiyan yê ko me dişand pê wan kesê ko sûcê wî giran an ew kesê ko yuzbaşî ji mere digot »divê hûn filankesî têxin işkencan« dikirin.



Gava gardiyan dihatin yek an jî du girtî bi wan re bûn, di hatina wan de

em radibûn ser xwe diçûn pêşiya wan û me weke garsonê aşxanakê, gazî

dikir:

— Fermo fermo, kerem bike, kerem bike.

Ji xwe wî keremî vir dikir, lê mebesta me ew bû em têra xwe tinazê xwe

bi wî bikin. Me ew kes li ser masê dida rûniştandin, hevalekî gardiyan jî

paçek di destê wî de û ser masê paqij dikir, ew diçû kesekî din weke gar-

son, di dest wî de qelem û deftereke biçûk, dihat ba girtî û digot:

— Fermo ez benî, tê çî bixwe û çî vexwe? Dest pê dikir, navê xwarinê û

vexwarinê rêz dikir, te digot belkî mirov li aşxanê ye. Pişt re jî weke girtî

xwarin xwestibe, garsonê me li deftera xwe dinivîsand û diqêriya:

— Kebabek, qedehek şerab û hinek meze li ber.

Garson diçû piştî qederekê bi şûnde vedigeriya, di destê wî de tepsiyek,

li ser wê mûmek û qedehek tije murekeb an jî dermanê firaxşûştinê dianî

didan ber wî kesî girtî û digot:

— Tu daxwazên te yên din hen e?

— Estefxurullah komandanê min.

Ji xwe kesên girtî çî bigotana pere nedikir, him wî dizanîbû ko wê çî bê

serê wî û him jî me dizanîbû, ko tiştên ji bo wî hatiye, ew mecbûr e hemûyan bixwe. Loma em hemû gardiyan dihatin li dora wî diciviyên,

mûm fikir destê xwe û digot:

— Zû bixwe û vexwe!

Ez bi xwe niha difikirim ko çawa wan kesan mûm dixwarin,! Ew tiştên

pîs jî vedixwarin. Ji ber ko ew mecbûr bûn vê yeka hanê pêk bianîna, ev

emirekî jor bû, eger ew li dij vê derketana an jî serî li me bigerandina, wê

têketina nav çend metre paçê sipî û wê biçûyana malên xwe, wan jî ev

yeka dizanîbûn. Mirina girtiyan li wir ji bo me tu problem dernedixist,

89

GARDIYAN

loma em ji kuştina wan neditirsiyan. Ji ber ko doktorê me yên li wir yên

nexweşxana leşkeriyê bûn, li gor daxwaz û raya yuzbaşî raporên xwe

dinivîsandin.

Ev jî bû bû tiştêkî nû di jiyana girtiyên wê girtîgeha bi nav û deng ya li

bajarê Diyarbekrê de. Carna jî em diçûn ber deriyê hin qawîşan û banî

kesê ko me dixwest lê bidin, fikir. Dema ew dihat berî derî û komûta

xwe dida, me digot:

— Dengê te baş derneket, me negotibû ko di dema komûtdayinê de

divê heta ji we bê hûn dengê xwe derxin, naxwe hûn naxwazin emirê me

bînin cih.

Him em di ser wan de diqêriyan û him jî me destê xwe diavît bêrika xwe ko mûmê derxin û bi wî bidin xwarinê, ji xwe êdî her gav mûm di

berîkên me de peyda dibûn. Dema ko me mûm derxist, em bi ser girtîde

diqêriyan û digot:

— De, devê xwe veke!

Ew jî mecbûr bû ko devê xwe vekira, dema wî devê xwe vedikir, me jî

ew mûma weke xiyarekî dixiste devê wî û digot:

— Baş bicû û bixwe ko ji bona careke din tu baş, bi nîzamî û bi dengekî

berz komûta xwe bide, bila ev yeke ji hemû kesên qawîşê re bibe ders,

kesê baş komûta xwe nedin, an jî baş neqêrîn, wê tikevin vê rewşê.

Em li benda wî kesî disekînin ko heta ew mûma ko me xistiye devê wî

dixwar, dûre me deriyê qawîşê digirt û em diçûn, lê me dizanîbû ko li dû

xwarina mûmê wê bîkeve çî halî.

Mebesta me bi vê kirinê ne deng nederxistin an jî baş komût nedayîna

wan bû, ji xwe her kes bi awakî baş fêrî her tiştêkî bû bûn. Di vir de mebest ev bû ko bi van metodên hovane çavê wan bêtir bitirsîn.

Wan

ji doz û welatperweriya wan sar bikin û dûr bixin û eger ne hemû bin jî,

hina jî wan bikin mirovên dewletê. Ji ber ko yuzbaşiyê me her dem dig-

ot: »kurê min eger hûn hina ji girtiyan bikaribin, bikin mirovê dewletê,

wê gelek fêda wî bighê dewletê, ji ber ko ew her tiştê kesên, komunîst û

kurtçiyên dizanin, li gor agahdarî û nerînên wan em ê bikaribin di de-

meke kurt de hêlîna wan hilweşînin.

Di virde tucarî ew daxwaza yuzbaşiyê me pêk nehat, eger hin mirov ji

ber hukmê lêdanê kire zîlamê xwe jî, lê ji ew tiştê ko wî dîpa pêk neanî. Jî

ber ko kesên weha di bîr û baweriyên xwe de ne têrgihîştîbûn. Ji wan

kesên ko yuzbaşî dixwest, bi tu rê û rêbazî me nikarîbûn bikirana peyayên

dewletê. Kesên weha gelekî bi hêz, quwet û bîrûbawerî bûn. Me çi dianî

90

GARDIYAN

serê wan, ew ji ya xwe danediketin. Mirov şaş û matmayî dima ko  
çawa  
kesên weha dikaribûn li ber îşkenceyan îdare bikin. Wan kesên ko  
dibûn  
mirovê dewletê jî, hin kesên ko dijminê komunîsta bûn, hin  
xwefiroş û  
hin jî ji kesên bîrûbaweriyên wan hatibû şikandin, pêk dihatin.

91

GARDIYAN

XIV

»Rojekê min girtiyên qawişa xwe derxistibûn meşê û sirûdên leşkerî  
bi  
wan didan xwendin.ê Lêdan û îşkencên min jî berdewam bûn, ji ber  
ko  
em her gav ji alî yuzbaşî de dihatin kontrolkirin,. Di demên meşê de,  
de-  
ma me lêdan nekira, em ne li gor dilê wî bûn, loma kesên îşkence û  
lêdan  
li girtiyan nekirina yuzbaşî ew dişandin cihê wan î ecemitiyê.  
Hey tepe-repa jopê min û qêrîn û warîna girtiyan bû ko dîna min dît  
gardiyaneke din gazî min kir, ez çûm ba wî û wî got:  
— Gardiyan! îcateke nuh ya îşkencê hatiye dîtin, ka tu jî li qawişa  
xwe  
biceribîne. Ê wî ji min re hemû şiklên dîtina îşkenceya nû şirove kir.  
Li

wê salonê bi hindikî, qasî 20-30 gardiyanî jî, ji bona ceribandina vê meto-

da nû sekinîbûn. Di vegeerê de em bi hev re hatin nava girtiyên ko meş

dikirin, min ew dan sekinandin. Di demên seknê de kêfa wan dihat ko

ew ê bikaribin, hinekî hilma xwe vekin, ma wan ji ko dizanî bûn ko ez ê

metodeke nû di serê wan de biceribînim. Loma min emir da û got:

— Qawiş, li ser çar rêza û bila di nava her rêzekê de qasî du metre navber hebe, rawestin.

Wan derhal ev yeka pêk anîn, çar rêz û di nava her rêzekê de qasî du

metre navber vekirin û li benda min rawestiyan.

Min gazî berpirsiyarê girtiyan kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Here qawişê û çar pakêt cixare bîne, zû!

— Tu emir bike komutanê min.

Piştî hatina mesûl û cixaran, îcar min emir da û got:

— Qawiş! heta sisiyan divê ji navê û berjêrtir tu tiştek li ser we nemîne,

dê heydê zû. Yeeek, dido... û sisêêê.

Herkeseke ji navê û berjêrtir xwe tazî kiribûn, tenê fanîleyekî tenik tenê

li wan mabû , îcar min dîsa gazî mesûl kir û got:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.

## GARDIYAN

— Her girtiyekî cixarakê bidê û cixara wan ji wan re vêxe.

— Tu emir bike komutanê min.

Êdî di destê her girtiyaekî de cixareyeke vêxistî hebû, dor hatibû, ceribandina wê îcata nû.

Min li dora xwe nêhîrt û dît ko yuzbaşî di şibaka jor de li min mêze dike, kêfa min hat, loma ez bêtir har û dîn bûm, ko işkenceyek baş bi wan

bikim, aferîmekê ji yuzbaşiyê xwe bigrim. Hema ez bi ser qawîşê de qêriyam:

— Qawîş xwe daqûl bikin,

Herkesî xwe daqûl kirin, serên wan, bi ber erdê de û qûna wan li jor bû,

ez jî bi rêzê ketim û min ew cixara ko di destê wan de yek bi yek xiste qû-

na wan, piştî ko min cixare di qûna wan de bi cih kir û got:

— Qawîş divê hûn îro cixarên xwe bi qûna xwe vexwin, eger cixara we

yekî bikeve, ji xwe ne hewcweye ko ez ceza we bêjim. Hûn bi xwe dizanin. Dê heydê zû vexwin.

Ez wer bawerim ko bi qûnê cixare vexwarin, li cîhanê cara yekem bû ko

me di girtîgeha Diyarbekrê de pêk anî. Dema me li wan mêze fikir, kenekî em digirtin, em him dikeniyar, him jî me fikir qîrewîr, da yuzbaşî me bibîne ka em çawa lêdanê û işkencê bi dijminên milletê xwe

dikin. Bi rastî jî di demên weha de kêf kêfa me bû, him yuzbaşî li me  
û  
rewşa wan girtiyan temaşe dikir, him jî me dizanîbû ko ew ê  
aferîmeke  
qenc bide me. Ew dîmeneke (manzara) gelekî xweş û delal bû,  
hemû gir-  
tiyan qûnbelotkî kiribûn, di qûna wan de jî cixare hebû, dûman bi  
ser  
qûna wan diket. Di rewşên weha de kêf dibû kêfa me û ya yuzbaşiyê  
me.  
Di bin vê tirs û xofê de cixara yekî îxtiyar ji qûna wî ket, dema cixara  
wî  
ket hema me gelesan bi hev re êrîştî ser wî kalî kir, me her yekî ji alîkî  
de  
dest bi lêdanê kir. Temenê wî li dor 50-60-bû, dibû ko ji ber temenê  
xwe  
wî nikarîbû, qûna xwe baş bigirta, loma jî cixara wî ket û lêdana ewilî  
jî  
wî bi xwe xwar. Him me li wî dida û him jî min ji wî re digot:  
— Çima cixare te ket? Wî got:  
— Komandanê min, hundirê min gaz kir û ji ber wê cixare ket. Eger  
hûn wê dîsa bi cih bikin, ez ê hîn bêtir lê mîqate bim ko nekeve.  
De îcar lê bide û lê bide hetanî ko ew kes, di nava destên me de ji  
heşê  
xwe ket, dûre me dev jê berda, lêdan bi dilê yuzbaşî bû ko wî hîn jî  
li me  
temaşe dikir. Piştî ketina wî kesî, qawîş êdî xilas bû bûn, me ew  
xistin



hundir, du kesan jî rahiştin mirovê kal û birin hundir.

Ma me kê guh dida kalo, em bi dar û joban bi kesê ko di şûna bavê

me

93

GARDIYAN

de bû ketibûn, qet ne dihat bîra me, ko niha hinek weha li bavê me

bikin,

em ê çî bikin. Yuzbaşî em çavsorî kiribûn, me nema dikarî bû tu

tiştêkî

baş û însanî bikira. Niha ew bûyer têne bîra min, ez bi xwe şaş

dimînim

ko çawa min ew tişt fikir, gotin zor e, lê bawerîkirin zortir e. Gelek

tişt

weke xeyala ne, lê rast in, min bi xwe jî tiştên weha gelek kirine.

Hingî me sosretê giran bi serê wan girtiyan de anî bû êdî me jî nizanî

bû em ê çî tiştên din bînin serên wan. weha li wan hati bû ko wan

çawa

bikirana diketin feqa me ya ko me ji bo lêdanê her gav vedida. Hingî

me

şikil û metodên işkenca ji bona wan îcat kiribû ko êdî li gor me tu

tiştêkî

zor nemabû, îcar em bi tiştên hûrîk û rindik ketibûn, lê dîna ko me

dît

ew tiştên hûrîk, ew qedexekirinên ko em qet li ser nedifikirîn

tesîrekê

nebaş li ser girtiyan dihîşt. Dema me wan tiştên hûrîk xiste jiyanê,

me dît

ko wana ji lêdanê, ji tî û birçîbûnê bêtir tesîr li ser wan dihişt, em baş têgi-  
hiştin ko ji bona wan, ne ew lêdana fizîkî, lê îşkencên pisîkolojîk bêtir  
tesîra xwe dihêle, êdî heta ji destê me dihat, me dest bi ûsul û metodên  
weha kir.  
Me li wan weha kir ko êdî di hundirê qawîşan ji bilî hin pêwîstiyên,  
ax-  
aftina bi hev re hatibû qedexekirin, ken û henek hate rakirin, çûyina tow-  
eletê an ji cihêkî hetanî cihekî din ya hundir qawîşê, bû bû nîzamî.  
Dema  
kesek biçûya toweletê pêwîst bû ko ew kes bi nîzamî ji cihê xwe raba, her-  
du destê xwe bi nigên xwe ve bizeliqanda, ne bi meşeke serbest, lê bi meşa  
nîzamî biçûya û bihatana. Razan jî bû bû bi nîzamî, weke; dema kesên  
radizan, pêwîst bû ko li ser piştê razana û her du destê xwe bidana ser sîn-  
ga xwe, eger kesek ji vî halî de biketa halekî din an jî hin kesan xuraxur  
bikrana pêwîst bû, nobedarê şevê ew hişyar bikirana û ew bi nîzamî bidana razandin.  
Eger girtî ji ne nîzamî razanê û xure xurê nehatana şî-  
yarkirin û kesên weha ji alî gardiyanekî de bihata dîtin, ji dilva kesê raza-

yî, ew kesê nobedar ceza dikşand. Lê ew kesên di xewê de dikirin  
xurex-  
ur tebata wan ji destê nobedaran tune bû, her ko deng bi wan diket  
nobe-  
daran ew hişyar dikirin, gelek kesên weha ji bê xewbûnê aqilê xwe  
wenda  
kirin.

Bi roj, di demên îstirehetê de pêwîst bû ko herkes bi awakî nîzamî  
rûniştta û çongên xwe bikirana zikê xwe, destên xwe bidana ser hev,  
da ko  
ew bi awayekî nîzamî rûniştana. Nig dirêjkirin, nig avîtina ser hev,  
ceza-  
yê wê hazir bû, me kesên weha du saeta dixiste lexeba (li derve li  
cihê  
talîmê karêz, cihoka ko ava gû yê toweletê tê re derbas dibû, hebû).  
Dîtina wan tiştên li gor me ne nîzamî, rehet bûn, ma me ji bo çi  
heval-

94

GARDIYAN

bendê xwe di qawişan de dabû çêkirin, bi saya wan agahdariya me  
ji her  
tiştên hundirê qawişan çê dibû. Ya jî, dema me qawiş di wan qulikên  
di  
dîwaran re kontrol dikirin, didît. Tenê ew qawişên ko hîn me  
zilamên li  
gor dilê xwe têda nedabûn çêkirin, wan ji herkesî kêmtir lêdan  
dixwarin

û me qawîşên weha jî ji hemûyên din bêtir kontrol dikirin.  
Weke berê min di hin gotinên xwe de anîbû zimên ko ew kesên ji  
bin  
çav (cihê lêdan û îşkencê) derdiketin dianîn girtîgehê, bê çi dihat  
serê  
wan. Pêwîst bû wan berê, »Sonda me, marşa milî û hîtaba serokê  
me  
Ataturk ji Ciwanan«re ezber bikirana û dû re jî hin sirûdin leşkerî  
jiber  
bikirana ko bikarîbana ji hucran derkevin û herin di qawîşekê de bi  
cîh  
bibin. Ji bo çûyîna qawîşan, gelek kesan ev tiştên me zû pêk dianin,  
ev jî  
li gor dilê me bû, me jî aferîma xwe ji yuzbaşiyê xwe digirt.  
Tiştêkî din ko ji bona min hêjayî bahskirinê ye, ev bû: Kalepîrek  
anîbûn hucrê, sûcê wî çi bû, ne min û ne jî tu kesê dîn pê nizanîbûn.  
Tenê zanebûna me di derheqê sûcê girtiyan de, gava hatina wan  
kaxezên  
ji alî sawcî ve dihatin çêdibû. Em gardiyan li dor wî kalepîrî diçûn di-  
hatin. Her roj me henek û tinazê xwe bi wî dikir, lêdan û îşkencên  
xwe jî  
ji ser serî wî kêr nedikir, ji ber ko yuzbaşiyê me her dem digot:  
»Binerin  
kurên min, divê zikê we qet bi kesên weha kalepîr neşewite, çi hate  
serê  
me ji derdê wan e, ma van xortên cahil ji ko rêyên weha dizanîbûn,  
tevde

kalên weha rê û rêbazî pêş wan kirine. Hemû fen û fêlbazî ya wan e. Loma

jî hûn çiqra li wan bidin, kême e.« Yuzbaşî bû ko ev digot, gotin ji yuzbaşî

û lêdan jî ji me bû.

Ew kalapîr, mecbûr bû ko weke herkesekî »sonda me, marşa milî û go-

tara Atatürk ya ji bo ciwana ezber bikira, ya na ew nikarî bû biçûya qaw-

işê. Kalepîrê me gelek di hucrê de mabû, wî fikir û nedikir, nikarî bû ew

ezber bikirana, loma me ji wî re got:

— Eger tu »sonda me û du qitayê (çarînên) marşa milî ezber bike em ê

te bişînîn qawişekê.

Kêfa wî hatibû, şev û rojên xwe bi ezberkirina wan dibuhurand. Qet sekinîn li wî tune bû. Wî êdî »sonda me« ezber kiribû, dor hatibû marşa

milî, lê wî çî fikir û nedikir nikarîbû ew ezber bikira.

Rojekê dema ez ketim hundirê hucrê, dengê kalo hate min ko wî karê

xwe yên ezberkirinê didomand, wî û ezberkirina sirûda milî di ber hev di-

dan, weha li wî zor hatibû ko nema dizanî bû çî bike. Hevalên wî çû bûn

qawişan, ew tenê di wê hucra sar de, tî û birçî bi ezberkirinê ketibû.

Dema min dengê wî bihîst, ez sekinîm û min guhdarî kir, wî digot:

## GARDIYAN

»Korkma sonmez ez bi qurbanê

Da ka zû xwe bi min bide ezber kirinê,

ya na ez ê bixwim lêxistinê

Eger tu zû xwe bi min bide ezberkirinê.

Ez ê jî zû herim qawîşê«

Ew weke bi mirovekî re bi axife, wilo bi wê sirûda milî re, bi sond û xita-

ba Ataturk re di axifî. Ji wî hebû ko dema ew li ber sirûdê bigere, wê ew

sirûd an jî merşa milî xwe zû bi wî bide ezberkirin. Lê dîsa ez karim bêjim

ko jî dengê wî xuya bû ko bê ew çiqas bi kîn û nefret bû. Te digot qey ew

xwe bike qurbana wê, sirûd jî ew ê xwe zû bi wî bide ezberkirin, kalê me

ketibû rewşeke nebaş. Lê wê demê ez qet li vî halê wî hay nedibûm, ko ew

di şûna bavê min de ye. Tew kêfa min bêtir dihat, min deriyê hucra wî

vekir û lêda, lêda û lêda ko çima ew nikare zû ezber bike...

Ez di rewşeke weha de qedere 16 mehan jiyam, ma ez dîn nebim kî ê dîn

bibe, piştî fêrbûna jiyaneke weha kî êdî dikare bi awakî normal di nava ci-

vatê de bijî, em jî bi wan kesên girtî re hatin şewitandin. Ew di rêyeke li

gor wan baş û li gor yuzbaşiyê me nebaş de bûn. Gelekan di wir de ser dan  
û sir nedan, lê ez û yê weke min, ma em di çî riyê de bûn, piştî qedand-  
ina leşkeriyê kî wê li me mêzeke, kî wê alîkariya me bike. Karbidestên  
girtîgehê karên xwe bi me qedandibûn. Em ew kesên feqîr berra hev dan,  
lêdana wan kesên girtî bi destên me dane kirin. Dema ez wan bûyer û kir-  
yarê ko min bi xwe jî kiriye, difikirim, ji xwe fedî dikim. Ez ji xwe nefret  
dikim, ko min çawa ew bêheşîya mezin kir! Lê niha tiştêk nema ji destê  
min tê, ez bûme malê avîtinê. Ne dewlet û ne jî tu kes ne li min û ne jî li  
rewşa min dipirs in. Me digot belkî piştî qedandina leşkeriyê jî dewleta  
me wê xwedîtiyê li me bike. Tew ez û yê weke min, roja ko me leşkerî  
qedand em hatin jibîrkin. Ma xwediyê mirovê feqîr kî ye! Ez weha baw-  
er dikim ko ew bi xwe ne. Dema ew jî ne li hev bin, dema ew jî îşkencê bi  
hev bikin, halê teva wê weke vî halê min be. Ma ev hal e, ma ev jiyan e!..  
De ka em îro jî gotara xwe li vir biqedînin, min soz daye te ko ez ê her

tiştê ko ez dizanim ji te re bêjim, bila qet şik ji te ra çênebe. Min carekê

biryara xwe daye ko ez ê bêjim, serê min jê here, ez ji ya xwe venagerim.

Ez dixwazim ew tiştên di tariyê de derkevin ronayiyê. Tu jê tiştên ko ez ji

te re dibêjim bi awayekê rast, weke ko em bi hev re axifîne di rojnameya

xwe de biweşîne. Bila hemû cîhan ji bûyerên girtîgeha Diyarbêkrê agah-

dar bibin. De rabe qurban, de rabe, tu jê bi min re perîşan bû, te dev jê

96

GARDIYAN

mala xwe berdaye û tu bi dû dînekî mîna min ketiye. Ne tu dersên xwe

dixebite, ne jê li keçika xwe dinêre. Binêre bê ez çiqas zerarê didim der û

dora xwe. Piştî ko ji leşkeriyê hatim û heta niha tu kesî ji min fêde nedîtiye. Her gav ez bûme weke agirekî û min dora xwe şewitandiye, zer-

ar daye xwe û malbata xwe. De rabe qurban de rabe îro bes e, sibê em li

vir dîsa hev bibînîn.

97

GARDIYAN



XV

Roja din dinê ew berî min çû wî girê li hemberî nexweşxanê û li bin dara

hijîrê rûnişt û li benda min rawestiya. Min jî xwe gîhand ba wî, me xêrhatin li hev da, dûre wî domand:

»Xwarin û vexwarina girtiyan li gor pêwîstiya wan bi zanetî ne dihat dayîn. Xwarina ko ji alî karmendê girtîgehê de ji bona girtiyan dihat dayîn, çemçikek şorbe bi çar kesan bû, ava ko me dida wan qasî ko rojê

qedehek para kesekî bikeve, dihat dayîn. Nayê bîra min ko tu carî girtî

bûne xwedî du qedeh av (Ji bilî hin îcaran). Tenê rewşa kesên xwefiroş û

muxbîran cûda bû. Ji bona pêwîstiya girtiyan li kantînê çay jî dihate firotin. Eger yuzbaşî bixwesta tenê ji firotina çayê, wî dikarîbû pereyekî

zêde qezenc bikira. Lê ji bona ko girtî her dem, di hasreta çayê de bin, wî

ev yeka jî nedikir. Lewra wî digot: »Divê her dem çavê girtiyan tî û birçî

bin ko em bikaribin, hina ji wan bikin zilamên xwe.

Me baş dizanîbû ko vexwarina qedehek çay ji bona girtiyan hertişt bû,

ji ber vê bû ko berî dayîna çayê, me lêdanek baş li wan dikir, dema em

diçûn ber deriyê qawişan me gazî wan dikir û digot:

— Qawiş!

— Emir bike komutanê me.

- Ma hûn çay dixwazin.
- Eger tu emir bike belê.
- Ma hûn dizanin ko berî vexwarina çayê wê çi bê serê we.
- Belê qomûtanê me, emir emirê te ye.
- Baş e, bîdona çayê li gel du kesan derxin derve.

Li girtîgehê tiştên cam, hesin û metalên hişk hatibûn qedexekirin,  
me

çay ji wan re di bîdonên naylon de dianî û wan jî bi qedehê naylon  
ew çay

vedixwarin. Ma em weha bê heşbûn ko em qedehên cam bidin wan  
û ew

tamekê ji çayê bibînin. Bi qedehên cam çaya germ vexwarin, ne li  
gor

nîzama wê girtîgehê bû. Ji bona ko em lêdana tevayî bikin, ji heftê  
carakê,

carna jî ji 15 rojan carekê, me çay ji wan re dibir. De îcar binere bê  
me çay

bi çi awayî dida wan.

98

GARDIYAN

Carekê ew du kesên li gel bîdonê derdiketin, ji herkesî bêtir lêdan  
dixwarin. Di hanîna bîdonê çaya germ têde carna destê wan jê  
dişewitî,

pêwîst bû ko wan bîdon ji kantînê heya qawişê bê bîhnvedan û dest  
guherandin hilgirtana. Ya na, çay bi devê wan nedibû, ji xwe ew êdî  
fêrî

vê yekê jî bû bûn. Her carê di anîna çayê de destên kesên derdiketin dişe-

witî. Lê her dem jî du kesan fedekarî dikirin, bêyî ko dilopek çay birjînin

erdê an destê xwe biguherin ew çaya germ digîhandin hetanî ber deriyê

qawişê. Eger dilopek çay jî bihata rijandin, wê rojê qawiş bê çay dima.

Loma wan kesên radihişt bîdonê germ him agahdariya wan ji bîdonê

hebûn ko çay nerije û him bi awayekî nîzamî li gel xwendina sirûda dimeşyan heta ber deriyê qawişê. Ji bona çi ez dibêim ber deriyê qawişê?

Biner bê ji bo çi!

Wan bîdonê çayê datanîn ber derî, lêdana xwe dixwarin û diketin hun-

dur. Ew çay hîn germ bû. Ma dibû ko em çaya germ bidin dujminê milletê xwe? Na, na nedibû, ji ber vê yekê me gazî dikir:

— Qawiş!

— Emir bike komutanê me.

— Têkevin rêza lêdana bi tevayî.

Girtî fêrî vê yekê jî bû bûn. Loma hemûyan li hundir xwe li ber derî dixistin rêzê, wan kesên berê lêdan bixwarana çaya germ jî bi xêra wê lê-

danê vedixwarin. De binêre bê me ew xistibûn çi rewşê ko ji bona vexwa-

rîna qedeheke çaya germ, herkesî dixwest ko berê ew lêdanê bixwin Me jî

bi vê yekê dizanî bû.

Vexwarina çayê jî bi vî awayî bû. De were ji bona qedeheke çay him destê xwe bişewitîne û him jî lêdana xwe ya qenc bixwe. Bi ser vî halî de

eger me ji wan re her roj çay bianiya jî wan nedigot na. Bi rastî carna em

bi xwe jî li halê wan ecebmayî diman.

Roj bi roj, saet bi saet tade û îşkencên me dianî serê wan zêde dibûn.

Her rojekê babet babet şiklê lêdanê dihate dîtin, her saet jî şiklekî nû di-

hate ceribandin. Êdî her lêdan û îşkencên me, bê berxwedan dihatin qe-

bûlkirin û pêkanîn. Tu kes êdî li dij kiryarên me ranedibû. Kesên ko ev

tişt qebûlnedikirin ew ji xwe di hucran de debûn, halê wan xerabtirîn hal

bû. Ew kesên di hucran de û serî ji kiryar û biryarên me re danetanî, me

yeko yek di hucran da, bi darê zorê, bi wan dida qebûlkirin, eger wextê

me jî zêde digirt, lê dîsa ji %95-ê girtiyan daxwazê me pêk dianîn.

Yuzbaşiyê me, ji me re digot: »Kurên min we firset bi dest xistiye, hûn

çi dikin bikin. Pêwîst e ko hûn van girtiyan bikin welatperwerên tirk.

99

GARDIYAN

Hûn wan bikin tirkên baş, damarên wan î qels bigirin ko êdî ew bibin mirovên baş û hevalên xwe yên derve bidin dest.

Lê tu carî ev merama yuzbaşiyê me pêk nehat, ne ew bûn tirk û welat-

perwerên tirkan û ne jî tucarî serîhildan û berxwedan ji wê girtîgehê rabû.

Her ko ew fêrî lêdanekê an jî şiklekî îşkencê dibûn, me îcateke nû di serê

wan de diceriband.

«cateke nuh, kêfxweşiyê li gor dilê me hatibû dîtin. Ev kêfxweşiya me

jî weha bû: Me girtî hemû bi hukmê çend dar û joban zû fêrî vê yekê jî

kiribûn. Dema ko em dihatin ber deriyê qawişê, bi dengekî berz me dig-

ot:

— Qawiş wenda bibin!

Hîn gotara me ne diqediya, hemûyan bi awayekî gelek lez û bez xwe di-

avîtin bin ranzeyan, dû re em diketin hundir, kê xwe tam di bin ranza da

bi cîh nekiribana, wî him lêdan dixwar, him jî bê xwarin dima. Carna jî

dema ko me digot »wenda bibin« . Di wê lez û bezê de, de du sê kesan

xwe bi hev re diavîtin bin ranzeyekê, lê ji bona ew hemû di bin wî ranza-

yî de xwe wenda bikin û tu dereke wan ji derve nemîne xwe diavîtin  
ser  
hev û bi vî awayî dixwestin xwe veşêrin. ‹car me li wan mêze fikir,  
ji bo  
ko em rûmeta wan bişkînin, ji bona ko em wan bi nebaşî bidin nasîn  
û ji  
bona ko em şexstiyata wan rencîde bikin, em diçûn ber wê ranzayê  
ko du-  
sê kes xwe di bin de bi cî kiribûn, me digot:  
— Ji bilî vê ranzayê, yê din hemû derkevin.  
Piştî derketina wan hemûya, me bi awayekî berz û bi ken digot:  
— Qawiş! hemû li bin vê ranzayê binêrin, baş binêrin ko bê hevalên  
we  
li wir çî dikin, ew çawa dikutin hev, binêrin hela çî bi serê hev dikin.  
Ma  
heqê kesên bênamûs çî ye?  
— Ceza li gor fermana te ye komandanê me.  
Dû re jî tiştên dihate serê wan ji xwe diyar bû.  
Car carna jî em gelek gardiyan diketin qawişekê, herkes diketin  
sekina  
nîzamî û li benda fermana me radiwestiyan.  
Me banî mesûlê qawişê fikir. Ew dihat ber me komûta xwe bi  
nîzamî  
dida. Ji xwe gelek mesûl jî bû bûn hevalbendên me û yê ne weha  
jî, me  
zêde li wan nedixstin ko ew daxwazên me li gor me di qawişa xwe  
de pêk

binin. Loma me gelek caran mesûl ji nav kesên girtî derdixistin.

Kesên

din hemû dixist sekina nîzamî. Em çend gardiyan diketin nav wan, li rewş û sekna wan mêze dikir dû re me digot:

— Sekina vê qawîşê ne nîzamî ye. Pêwîst e hûn bêne cezakirin. Û

100

GARDIYAN

hevalekî din bi hêrs digot:

— Heta sisiyan her kes çar cixareyan têxin devên xwe.

Ev emir bi awayekî zû dihat cih, dûre yekî din digot:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.

— Şibakan bigire.

— Tu emir bike qomûtanê min.

Piştî girtina şibakan jî îcar hevalekî din, digot:

— Qawîş, cixareyan têxin devê xwe û weziyeta pêxistinê bigrin. Di de-

vê wan de çar cixare hebûn, di destê wan ê çepê de niftik û yê rastêde

darikê niftikê, li benda emirekî din radiwestiyan. Emirekî din ji alî

hevalekî din dihat dayîn. Li vir mebesta me ew bû ko hemû gardiyanên

ko ketin hundir biaxfin loma her carekê me yekî emir dida.

— Pêxin.

Bi yek dengî hemû darik pêdiketin, ew kesên ko darikê wî pê neketa,

halê wî diyar bû. Bi kurtasî wan çî bikrana jî nikarî bûn xwe ji ber  
destên  
me bi awakî bê şaşitî xilas bikirana. Heta cixare pêdixistin, gelek  
lêdan  
dixwarin. Hina cixarên xwe zû pêdixistin, darikê hina pê nediket. Ew  
qawîşên gelek kes têda dijiyan û her kesekî çar cixare pêdixistin,  
şibakê  
wan jî girtî, bûn. Dibû kufe kufa wan. Dûman bi ser serê wan bilind  
dibû, êdî weha dibû ko çav çavan ne didît, herkes dikuxiyan, me jî  
bi  
awayekî kêf li wê rewşa wan mêze dikir û di ser wî halê wan de,  
dikeniyân,  
tinazê xwe bi wan dikirin.  
Ma tu dibê em weha disekînin, na vê yekê têra me nedikir. Gelek  
caran  
jî, me yek cixare bi kesekî dida vexistin, li dora diçûn û diatin, me bi  
ser  
wî de dikire qêrînê û me digot:  
— De bila dûmana cixarê di çavê te de derkeve, bila dûman di  
guhên  
te de derkeve!  
Dûmana cixarê ji guh an jî ji çavan derxistin, ne tiştê mantiqîye û  
tu  
kes nikare derxe, lê dîsa jî gelek girtiyan weha zor didan xwe ko te  
digot  
belkî niha ew ê dûmanê derxe, lê wî rebenî çî dikir û çî nedikir dîsa  
dû-  
man dernediket, emirê me ne dihate cih û cezayê wî giran dibû,



Di demên weha de armanca me ew bû ko em lêdanê li wan bikin,  
lê me  
weha xwe û ew fêr kirî bûn ko em tucarî li kesekî bê sûc naxin. Loma  
jî  
me sûc ji wan re didît, sûc, ji ber xwe dernediket, dema wan  
dûmana  
cixarê di çavên xwe de dernexistina, wan bi vê kiryara xwe emirê  
me ne-  
dianîn cîh. Ji xwe dema me ji girtiyan pirsbikira:

101

GARDIYAN

— Em tucarî li kesên bê sûc dixin? Bersîva wan ev bû:

— Na, komutanê me.

Lewra berî ko em li yekî bixin, me ji wî re sûcek çêdikir û dûre lê  
dida.

Dîsa hêjayî gotine ye ko ez li ser vê yekê jî ji te re bûyerekê bêjim:  
Rojekê me êrîş bir ser qawîşekê. Em li dora girtiyan çûn û hatin ko  
sûcekî ji wan re peyde bikin, loma hevalekî got:

— Herkes çar cixaran têxin devê xwe. Dema herkesekî cixarên ko  
me

gotibûn, di nava lêvên xwe de bi cih kirin, hevalekî got:

— Weziyeta pêxistinê bigirin.

Girtiyeke ev emir şaş famkir, cixara xwe pêxist û dema wî li dora xwe  
nerî ko hîn tu kesî pênexistiye. Xwest zû bi zû wê cixara ko pêxistiye  
vem-

rîne. Rewşa wî ji alî min de hate dîtin û hema min got:

— Ew kesê ko cixara xwe berî emirê vexistinê, pêxist, bila du gava

derkeve ortê.

Ew kes ji nava hevalên xwe derket, du gav pêş de avêt, komûta xwe ya

nîzamî da. Wî baş dizanî bû ko rewşa wî nebaş e, dixwest vê rewşa nebaş

bi komûta xwe ya bi dengê berz û nîzamî bide wendakirin. Lewra gelek

caran me girtî ji bona komûta nîzamî azad dikirin, li wan nedida. Êdî we-

ha bû bû ko him ew fêrî vê yekê bû bûn, him em. Loma vî kesî jî dixwest

weha bike, lê em ji bo lêdana wan hatibûn, bê lêdan em nikarîbûn der-

ketana, ez fitilîm ser wî û min gotê:

— Min got cixarê pêxin an waziyeta pêxistinê bigirin?

Vî bersivand:

— Te got waziyeta pêxistinê bigirin, qomûtanê min.

— Ê baş e, te çima pêxist?

— Min ji ber nezanî û cahiliya xwe emrê te pêk neanî. Di emirdayînê de ez şaş têgihîştim.

— Baş e, şaş têgihîştina emiran, cezayê wê çî ye?

— Ev girêdayî takdîra komutanê min e.

— Baş e, waziyeta lêdanê bigire.

Piştî lêdaneke delal min jî wî re got:

— Here çihê xwe?

— Tu emir bike komutanê min.

Wî silav da û çû çihê xwe. Tiştê di virde girîng , ew kes ne mirovekî

cahil û nezan bû. Wî unîversîte dixwend, li gor gotina jî, wî kesî di işken-

ca polîsan de tu tişteke negotibû. Loma jî yuzbaşiyê me gelek ji wî aciz bû.

Yuzbaşiyê me dixwest ko em her roj li wî kesê bidin, lê wî kesî, xwenda û

102

GARDIYAN

zana ji min re digot »ez cahil û nezan im« di rastiya xwe de wî ev ji min re

digot, lê ma kê ev gotara wî fam dikir, ji ber yê »cahil û nezan« ez bi xwe

bûm. Ez niha tê digêhijim ko wan gelek caran ji me re tiştên delal digotin,

lê gelekî mixabin em tê nedigihîştin, dema wan digot: »ez cahil û nezan

im« kêfa me dihat. Em diketin wê baweriyê ko em gelekî zana û aqil-

mend in.

Rojekê ji rojên havîna Diyarbêkrê ya meha tebaxê bû. Kelekela germê

û ji ber lêdan û meşê hal di girtiyan de ne mabû. Betonê derve bibû weke

êgir.

Li ser wî agirî me girtî tazî dikirin û li wir bi zikkişkê, di ser wî »agirî« de dibir û dianîn. Rewşên weha carna bi saetan dom dikir, weha li wan

dihatin ko êdî kesek ne dikarîbû ji cihê xwe bilive. Di Rewşên weha  
xerab  
de me dîsa meş bi wan didan kirin sirûdên leşkerî didan xwendin,  
rojekê  
dîsa ew gardiyanê hevalê me ko me navê wî »Gestapo« danîbû,  
qawişa  
xwe derxistibû meşê. Dema wî meş bi kesên girtî dida kirin, em bi  
xwe jî  
carna ji wî halî wî aciz dibûn girtiyan çawa ew tehamuldikirin ez bi  
xwe  
nema dizanim. Em vegerin ser kiryara wî ya wê rojê, wî hey lêdana  
xwe  
didoman û bi ser serê girtiyan de diqêriya digot:  
— Deng dernakeve, deng dernakeve!  
Her ko diçû dengê girtiyan hîn berztir dibû, tepe repa nigê wan hîn  
baştir dihat, lê wî dîsa gazî dikir:  
— Deng dernakeve.  
Ji xwe me dizanîbû ko ew ê wê rojê tiştêkî bîne serê wan. Lewra  
dema  
em li girtiyan li manayekê digeriyan, mana di rastiya xwe de tiştêkî  
bê  
mane bû, acizîya me bû, nezanîna me bû û cahiliya me bû. Gestapo  
we-  
ha li qawişa xwe kir ko êdî hal di kesekî de nema. Em çend gardiyan  
jî li  
jor bûn me li wî û li qawişa wî mêze dikir, ji xwe çî dema gardiyanek  
qaw-

işa xwe derxista meşê, her dem ew ji alî çend gardiyanên din ve dihat kon-

trolkirin. Yek ji bo ko tiştekek bê serê wî, wî zû xelas bikin, ya dudiyan jî ew

bû ko bê hela kîjan gardiyan zêde lêdanê dike. Ev emir jî ji alî yuzbaşiyê

me de hatibû dayîn.

Di dema meşê de hew dîna ko me dît, Gestapo gazî dikir û diqêriya:

— Hawar, hawar, girtî li min dixin, gardiyan werin zû alîkariya min de.

Bi wî dengê wî yê berz, beyî ko em bifikirin, me gazî hev kir û got:

— Qawişê îsyân kir, qawişê îsyân kir. Bi rastî me jî nema dizanî bû, çî

bû. Gaziya me li girtîgehê belav bû. Gardiyana dengê serîhildanê bi-hîstin, bi bazdan hatin cem wê qawişê. Her ji me çar gardiyana girtiyek

103

GARDIYAN

ket û me dest bi lêdanê kir. Gelek hevalan dizanî bû bi rastî jî qawişê îsyân

kir. Di rastiya xwe de tu tiştekekî weha tunebû. Tenê dayaxa girtiyakî ji

meşê re nemabû. Çend caran li erdê ket, lê dîsa gardiyan ew radikir û

dixwest ko nîzamî bimeşe. Ji ber vê yekê gardiyan li wî dida. Girtî jî gelekî

hêrs bû bû û wî jî kulmek li gardiyan xisti bû. Nava gardiyan qetiya bû.

Gestapo weha texmin kir ko hemû girtiyan li wî da. Ji ber em her gav bi

tirs bûn. Tu rastiye bêje, em ji wan kesên dest û niga wan girêdayî gelekî

ditirsiyan, ma em tenê na, na, tirsonekê herî mezin yuzbaşiyê me bû. Ew,

bêyî çend gardiyana tu carî newêrîbû biçûya qawîşan. Her cara ko ew

derketa gera qawîşa me 10-15 gardiyana xwe dida dora wî.

Lê çi dibê bila biba yekî girtî li gardiyanekî xistibû. Lêdana gardiyana gelekî xeter bû, pêwîst bû me rê neda tiştên weha. Eger me cezayekî giran

li kiryarên weha nebiriya, nedibû. Roja din yekî din dikarîbû, li hevalekî

me yê din xe. Loma em ketin nava wê qawîşê. Em her 4-5 kes li ser serê

girtiyekî ko dest û nigê wî giredayî kom bûn. Me lêda û lêda, heta tu bibê

bes. Lê wî gardiyanê girtî lê dabû, ji xwe ew har bû bû, bi hatina me re ew

êdî mêrxas bû bû, wî çend kes bêhiş di erdê rakiribûn. Çend girtiyên, ko

temenê wan biçûk ji nava girtiyan derxist û bir. Me fam kir ko wî ew kude birin. Piştî qederekê li qawîşê vegeriyan. Heta ew hatin me jî kesên

dî qawîşê de ji hal xistibûn, piraniya wan weke miriyan li erdê dirêjkirî

bûn, wî hevalê gardiyanê me bi awayekî kêf, bi rûyekî ken û bi dengekî

berz got:

— Girtîno we îro li min da, lê ev ji we re namîne, îro tiştê me anî serê

we hindik e. Dî ber bêrêtiya we de min jî hevalên we bir in . Min çî anî

serê wan ma hûnê ji ko bizanibin? Ez ji were bejim; min ew birin, yeko

yek jop rada wan, ew karê xweş û delal bi wan kir. De zû têkevin hundir

ko êdî em qawîşên din jî mîna we li wan bikin, bila cezayên wan jî bê

dayîn. Dûre ez ê we bibim hucre.

Ji wê rojê û pê de navê wî hevalê me bû »Gestapo«. Ji xwe me her gardiyanekî ji ber kiryarekê navek digirt. Navê wî jî weha lê hat kirin, kê-

fa wî jî ji navê wî re dihat.

Wê rojê tenê lêdan hebû, xwarin, av û tiştên din tune bûn. Me weha anî serê wan ko ew ji hemû girtîgehê re bû derseke qenc. Piştî wê bûyerê

êdî kesekî nema diwêrîbû dengê xwe derxista, kesekî bi serê xwe jî nema

diwêrîbû, bêemiriya me bikrana.

Dû re me ew qawîş bire hucre. Li wir me bi dilê xwe cezayê wan li wan

birrî. Me her roj lêdan û işkence bi wan dikir, ew derdixistin ser  
betonê û

104

GARDIYAN

bi daran bi canê wan diketin. Carna yuzbaşiyê me dihat, guhdariya  
lê-

dana wan dikir, gazî me dikir û digot:

— Ka dengê hestiyên wan yên şikistî nayê min, lêxe, lêxe, bila  
hestiyên

sax di canê wan de nemîn e.

Ji xwe dema ko yuzbaşiyê me weha digot, lêdan ji bona me dibû,  
kêfxweşî, rehetî û karekî muqades. Lêdana li girtiyên qawîşê teva, ji  
bona

yekî destê xwe li gardiyan rakiribû. De îcar bifikire ko bê çî tişt hatin  
serê

wî rebenê ko li gardiyan xistibû.

Tu zanî çima, dema kesekî girtî bi serê xwe şaşiyek bikira, emirekî  
gardiyaana pêk neaniye, di rûyê wî de me li hemû girtiyên qawîşê an  
jî li

yên girtîgehê teva dida. Yuzbaşiyê me tim ji mere digot ku: »Binêrin  
hevalno, eger hûn bikaribin, van girtiyan xwe bi xwe berra hevdin,  
wê

demê karên we rehetir û hêsantir dibe, De ez we bibînin, eger hûn  
di

virde bi serkevin, mana xwe ew e ko em bi serketin, me rêya  
serhildanê ji



wan girtiye, dema ew xwe bi xwe ji hev ne xweş bin, wê demê jî kes  
wê li  
kesî guhdarî neke.« Ew axaftina yuzbaşiyê me ji me re bû rehber.  
Me bi  
dest lêdanê kir û li şertê ko em ê wan berra hev din, digeriyan. Lê  
me tu  
neticeyek baş ji tu metodên xwe ne girt.  
Em bêjin ko dema meşê de eger kesî xwe şaş bikra ji bona  
xweşaşkirina  
wî kesî, hemû qawîşê lêdan dixwar. Me weha dikir ko girtî ji wî re  
bêjin  
»kuro de bes e, êdî, em ji rûyê te lêdanê dixwin, tu jî xwe zû fêr  
bike«. Lê  
ji bêdela ko ew ji hev re gotinên weha bêjin, wan ew hevalê xwe  
yên nezan  
zû fêrî meş û xwendina sirûdên leşkerî dikirin. Ji bo ko hevdu fêrî  
tiştan  
nekin û alîkariya hev nekin me bi hev re axaftina wan jî qedexa  
kiribû, lê  
dîsa wan çî dikirin axaftina nava xwe, weke me dipa qut ne kirin.  
Carna  
jî me ji girtiyan du kes derdixist û me weha dikir ko ew li hev  
bixin.Me  
digot:  
— ..... de pênc sîlan baş li .....bi xwe!  
Eger ..... li .... nexista wê demê me lêdaneke baş li herduyan jî dikir,  
ji

bona ko em li herduyan nexin wan weke me dixwest li hev didan û  
ji hev-

du jî aciz nedibûn.

Di vir de me çî kir û çî nekir, me nikarîbû nakokî têxista nava wan.

Ew

weha bi hev hatibûn girêdan ko aqilê mirovan nedigihîştê. Ji hev  
hez

dikirin, li hev guhdarî dikirin. Em jî êdî li wan heyirî bûn, me ne dizanî

ko em ê çawa bikin, her roj yuzbaşî ji mer digot: »Ka we çî kir, ma

qey

hûn li wan nadin, ma qey zikê we bi wan dişewite. »Bînêrîn, ez  
heneka

nakim. Jî dêlva wan, hûn dikarin ceza bixwin«. Bi vî awayî yuzbaşî

tîrs di

105

GARDIYAN

me de dîfirandîn. Bî van tirsên wilo me vedixwar, em serxweş  
diketin û

em diketin nav girtiyan lê bê fêde bû...«

106

GARDIYAN

XVI

»Ew kesê çavsor, yuzbaşiyê me yê devbîxwîn, Esat Yildirim ko  
nedixwest

girtî zanibin biryar û metodên lêdanê, ew bi xwe derdixe. Wî  
dixwest kir-

yarên di girtîgehê de têne kirin, têkeve hustiyên gardiyana. Loma jî dema  
ko ew li qawişan digeriya, bi devekî nerm bi şefqateke mezinbûnê  
bi gir-  
tiyan re qise dikir ko mirov digot qey melek e, lê ew melekê  
xerabiyê,  
melekê dijminatîyê bû.  
Yuzbaşiyê me Esat, mirovekî pir tirsonek û kêş bû, wî esrar dikişand,  
araq vedixwar, loma jî her dem çavên wî nepişî bûn, dixwest ko em  
ew  
kesên li wê girtîgehê de gardiyan bûn, weke wî bin. Wî her tişt ji bo  
me  
serbest kiribû, car carna jî wî em dawetî vexwarinê dikirin, wî bi  
destê  
xwe qedehên me dadigirt, cixareyên bi esrarê dagirtî dida me û wî  
bi destê  
xwe cixareyên me vêdixist. Piştî ko em serxweş diketin, êdî wî dest  
bi ax-  
aftina xwe ya ko li dij wan kesên girtî dikir, weha dikir ko me digot  
hema  
niha em herin û çend kesan ji wan bikujin, ji xwe biserketina yuzbaşî  
yek  
jî ev bû. Hele hele di rojên taybetî de (weke 12 îlonê) wî em baş  
serxweş  
dikirin û dişandin ser girtiyan ko em li wan bidin, dema me li wan  
dida  
wî jî di şibakan de mêze dikir, ji dengê hawar û lêdana girtiyan  
sermest

dibû, kêf dibû kêfa wî, roj dibû roja wî. Di kêfxweşiyên weha de gelek

caran ew ji bona ko baş ji me emîn be, hemû tiştên me ji alî wî de dihat

kontrolkirin, baweriya wî bi me tu kesî nedihat, di demên lêdanên hu-

cran de ew jî dihat ba me û wî weha digot:

— Qardiyan! niha ez jî weke girtiyekî werim, hûn ê çî bi min bikin?

Bersîvên me yek bûn, em ji wî fêr bû bûn. Me weha bersîv dida wî:

— Eger tu jî wekî girtiyekî bê vir ez ê di diya te jî.....

— Aferîm, eger te weha negota min ê di diya te...

De binere ko navbêra me û ya yuzbaşî ewqasî xweş bû, me jî dikarîbû

ji wî re hertişt bigota, dema me digot kêfa wî dihat, ma di serbestiyeke

weha de kî ê, wê ecêba ko me dikir, nekira. Kesî nedixwest ko ji wê re-

hetiyê derkeve û here li leşkeriyê de nobetê bigire, lêdanê bixwe. Li wir

yanî li girtîgehê, me lêdan dikir. Di gelek waran de azadiya me hebû, yeka

107

GARDIYAN

me tu carî nedibû dido.

Me rojê du caran serhejmara qawîşan dikir, carekê serê sibê û ya din jî

êvaran bû, mebesta serhejmarê ev bû ko bê ka kî reviya ye, kî ne  
reviya ye,  
lê mebesta wan serhejmarên ko me di girtîgeha Diyarbêkrê de dikir  
ne ev  
bû. Kesekî nikarîbû ji vir bireviyana, tu kesekî nikarîbû, xwe ji wir  
azad  
bikirana. Ji dêlva carakê me rojê du caran serhejmar dikir ko em  
bikarib-  
in rojê du carên lêdanê garantî bikin. Gelek kesên efsar û sermend  
ko li  
girtîgehê polîs bûn lêdanên taybetî dikirin, li rewşa girtiyan mêze  
dikirin  
û li gor zanebûnên xwe qasî ko em tê ghiştin wan rapor didan,  
berpirsi-  
yarên xwe.  
Piraniya wan kesên efser yên di serhejmaran de beşdar dibûn  
polîsên  
sivîl bûn, em weha tê ghiştin ko ew kesên weha jî alî MIT'ê de  
dihatîn  
şandin, wan kincên efseran li xwe dikirin û bi me re diketin qawîşan,  
bi  
taybetî jî wan li ew kesên ko di îşkencan de qise nekiribûn dixistin.  
Lê  
dîsa jî me, ji karê wan tu tişt fam nedikir, ji xwe yuzbaşiyê me digot  
ku:  
»Gardiyanên min divê hûn zêde aleqederên xwe ji van efserên ko  
serhej-  
maran dikin neynîn« loma jî em zêde li ser vê yekê raniwestiyan.

Kesên weha bê lêdan tucarî ji qawişan dernediketin, ew jî fêr bû  
bûn ko

divê berê ji girtiyan re sûcekî bibînin û dûre lêdana xwe bikin.

Serhejmara qawişan diyar bû, dido dido diketin rêzê û weha jî  
dijmartin,

lê carna efser tu kêmasî nedidîtin, îcar hina ji wan ji serê rêzê kesek  
derdixist, û digot »bijmêrî«, ji bona ko girtî fêrî jimartina weha ne  
bû

bûn, gelean xwe şaş dikirin, ew bêtirîn kesên nexwenda bûn, yanî  
dema

kesek ji serê rêzê dihat derxistin, jimartin dibû fer, girtiyan digot in.  
»1-3-

5-7« Şiklê vê hejmartinê ne weke ya din ko ew kesên ne xwenda  
fêrî wê

bû bûn.

Di şevên nobedariyên wan efsaran de qawişan tu rehetî ji xwe  
nedikirin, cixarên piştî şîvê nedikişandin. Piştî xwarinê emir dihat  
dayîn

ko hemû qawiş weziyeta serjimarê bigrin, di rewşên weha de jî  
çûyîna

tuwaletê, cixare kişandin, av vexwarin, qedexe bû, pêwîst bû ko her  
kes li

ser niga li benda kesên ko wê serjimarê bikin disekinîn. Me weha  
texmîn

dikir, êdî girtiyan jî dizanibûn ko di şevên weha de ew efserên polîs  
nobe-

dar in. Loma jî dema ko me deriyê qawişekê vedikir, mesûlê girtiyan

qomûteke weha didan ko dîwar dihejandin. Em diketin hundir efsar dig-

ot:

— Bijmêre.

Herkese kî serhejmara xwe bi nîzamî dikirin, kesî xwe şaş nedikir, loma

108

GARDIYAN

jî êdî efsar kesek ji serê rêze derdixist û dîsa digot:

— Ew nebû ji serî de bijmêrin.

Di fer jimartinê de hina xwe şaş dikirin, wê demê jî ji bona wî kesê ko

polîs bû û cilên efsaran li xwe kiri bû kêfa wî dihat. Di şaşkirina jimartinê

de polîsê me lêdana ko dixwest dikir«.

Dema gardiyan ev bûyer weha ji min re şirovekir, wê demê hevalekî ko

navî wî Hesên bû, hate bîra min. Dîsa di rojê weha de bû, dema ko

gardiyan û ew polîsê ko kincên efsara li xwe kiribû, ketin qawişa me, me

jî gelek hevalên nezan û nexwenda weha xistibû rêzê ko hejmara wan bi

wan dabûn ezber kirin, dema dora wan dihat wan jî hema wê hejmara

xwe ya ko jiberkirbûn digotin.

Me serhejmara cara ewilî baş kir, li gor nîzam û qaîdan pêk hat,  
efser

nerî ko nabe, îcar wî yek ji serê rêzê derdixist û ji dêlva cot em bûne  
fer,

wî got:

— Ew nebû dîsa bijmêrin!

Heval dest pê kir 1.3.5 û ûhw. dema dor hat ser hevalê Hesên wî  
dîsa

weke berê hejmara ko wî ezber kiribû got. Ji dêlva wî yê bigota 15  
wî got

16 hema di cih de efser got:

— Bes!

Em hemû sekinîn, ew kenîya berê xwe ber bi Hesên ve kir û got:

— Wer, wer, hela wer, ez ji te re serhejmara te bêjim.

Heval Hesên ji nava me derket, gavekê dûrî wî sekinî, berê silava  
nîga,

dûre ya serî û dûre bi dengê gelekî berz got:

— Hesên! Mêrdîn, emir bike qomûta....!

Hîn wî qomût temam nekir, efser kulmek pê ve danî, Hesênê me bi  
wê

kulmê ket û ranebû. Me dîzanî bû, ko wî çawa li heval da, lê tişteki  
ko ji

destê me jî bihata tune bû, me nikarîbû rahişta wî jî, piştî ketina  
hevalê

Hesên, dilê efser rehet bû û wî îcar serhejmar rast kir û derket, di  
derke-

tandinê de got:

— Divê hûn wî zû bînin ser heşê wî.



Derketin û çûn, ew çûn lê hevalê »mirî« di nav destê me de ma, me  
hi-  
na av li ser çavên wî kir, me hina ew mesaj kir, me hina jî bawêşîn  
dikir  
ko ew hênik bibe. Wel hasil piştî qederekê Hesenê me bi ser heşê  
xwe hat  
çavên xwe vekir, bi çav vekirina wî re kêfa me jî hat ko ew ne miriyê,  
de-  
ma wî çavên xwe vekir û li me mêze kir, em her yek dişibandin  
gundiyekî  
xwe, bi me re dixeyîdî û em hin jî dişibandin mirovên xwe carna bi  
destê  
me yekî digirt, jî yê din pirsî û digot :

109

GARDIYAN

— Kurapê min, ma gelo apê min û amojna min çawan e? Min ew ji  
zûde nedîtine. Di vî halî de hevalê me Hesen roja duda bi ser heşê  
xwe de  
hat. «car tiştên ko wî bêheşê xwe digot, ketibû devê me yên ko skeç  
û pan-  
domîn çêdikirin, bi rojan me li ser wê bûyera hevalê Hesen pêkenîn  
û  
skeç, ji havalên din re amade dikir. Ji xwe malzemên skeç û  
pandomîmên  
me, ji nava wan bûyerên ko bi serê me dihate derdiketin.

110

GARDIYAN

## XVII

Di demên meşê de, kesên ko xwe şaş bikrana yan jî dengê xwe baş dernexistina, an jî çongên xwe hetanî zikê xwe hilnekişandina jor, jî alî

me de dihatin cezakirin.

Me baş famkiribû ko êdî girtî ji lêdanê natirsin û em bi wê lêdanê nag-

ihên tu armançan. Loma me dixwest ko em her şikilên tadê û îşkancan di

wan de bi karbînin. Me şiklekî weha dîtibû ko hemû girtî ji wê metodê

gelekî aciz bûn, acizbûna wan her car ji alî me de dihat dîtin.

Li derve li cihê ko me meş bi wan dida kirin, cihoka (laxima towaletê,

karêzê) hebû, ser wê cihokê bi kevirekî beton î mezin hatibû girtin, dema

ko kesek ji alî me dihat cezakirin, me ew kevirê ser wê laximê bi wî dida

rakirin, ew ê ko ceza heq kiribû dikete wir, xistina wi jî li gor şiklê cezayê

bû, em bêjin ko cezayê girtî ne zede bû, wê dema me ew kes heta çongan

dixist wir û bi vî awayî li gor giraniya sûcê wî me ew di nava pîsî de dida

rûniştandin, an jî sekinandin. Ev metoda me ya nû him ji bona me rehet

bû û him ji bona girtiyan cezayekî gelekî giran bû, ji ber ko ew di nava gû

de diman, piştî derxistina wan ji wir bi rojan ew bêhna pîs ji wan ne di çû.

Lewra av tune bû, ko ew xwe bişon, bêhna wî gûyî, di qawişê de belav

dibû, herkesî nesîbê xwe ji wê bêhnê digirtin. Ji ber wê bêhna pîs me

dizanî bûn ko girtî diketin çî rewşê, ev yek em kêfxweş dikirin, ew hevalê

gardiyan ê ko ev îcat dîtibû, yuzbaşiyê me perakî baş û mehek jî îzin dabû

wî.

Ji bona ko her qawiş bikaribin, toza xwe ya di hundir qawişê de bidin serhev û ji bona gemara xwe bavêjin, me her qawişê tenekayeke tozê dabû

wan.

Valakirina wî tenêkeyî, ji heftê rojekê bû, ew roj jî ji alî me de hatibû beyankirin. Eger qawişekê berî roja valakirinê, teneka xwe dagirtibana û

ew ji alî me gardiyanekî de bihata dîtin, me ew teneka tozê bi girtiyan di-

da xwarin, wer dida xwarin ko weke ew xwarineke xweş bixwin. Ma mêr

hebûn ko nexwarina an jî mêr hebûn ko li dijî emirên me derketana.

Em bêjin ko qawişekê berî roja valakirina tenekê tozê, ya xwe dagirtiye

111

## GARDIYAN

û me dît. Me xeber dida çend gardiyanên din û em qederê 9-10 gardiyanan bi hev re diketin wê qawişa ko tenekayên xwe ya tozê berî de-

ma xwe dagirtiye.

Berî ko em ê têketana hundir, gardiyanê wê qawişê, gazî mesûlê wan

dikir û digot:

— Mesûl!

— Emir bike komutanê min.

— Teneka we ya tozê berî dema xwe hatiye tijekirin. Loma jî divê îro

em cezayekê li we bibirin, de zû têkevin rêzê, va ye em tîn.

— Tu emir dike komutanê min.

Dema ko em diketin hundir, mesûlê girtiyan çend gava ji wan dûr diket, silaveke nîzamî dida û ji qawişê re digot: »Dîqat« yanî hazir be. Û

em diketin hundir. Li dor girtiyan diçûn û dihatin, çend kesên ko li gor

me ne nîzamî sekinîbûn, lêdan dixwarin û dûre gardiyanê qawişê digot:

— Hûn dizanin cezayê ko em ê îro bidin we çi ye?

Wan bi hev re digotin:

— Na, qomûtanê me.

— Belê, belê hûn dizanin, ma hûn nizanin ko dema tenekê tozê berî dema xwe bête dagirtin, hûn ê bêne cezakirin. Hûn emirê ji alî me de tê

dayîn pêk naynin. Kesên ko emirê tê dayîn pêk neynin, wê bêne ceza-

kirin. Ceza we jî wê ji bo vê yekê be, pêwîst e ko hûn wê toza ko di teneke de ye bixwin.

Wan bawer nedikirin ko em ê bi rastî tozê bi wan bidin xwarin, loma wan digot:

— Tu emir bike qomûtanê me.

Gardiyanê qawişê gazî mesûlê girtiyan dikir û digot:

— Mesûl!

— Emir bike qomûtanê min.

— Zû teneka tozê bêne vir.

— Tu emir bike qomûtanê min.

Bi awayekî bi lez mesûl diçû teneka tozê ji towaletê dianî û li benda emirê me disekinî. Gardiyanên wê qawişê ji wê rewşê gelekî kêfxweş

dibûn, loma bi awayekî devliken û hebekî jî sert digot in:

— Tenekê valayî orta qawişê bike.

Mesûl teneke valayî ortê dikir û digot:

— Emirê te hatiye cih qomûtanê min.

«car ne tenê gardiyanê qawişê em hemû gardiyanên wir gelekî kêfxweş

112

GARDIYAN

dibûn ko em van mirovên xwenda, zana û gelekên wan di şûna bavê me

de me bûn, weke heywana, wê toza ko wan avêtiye, bi wan bidin  
xwar-

inê. Ma tu nizane ko çîqa xweş bû ko dema wan bi hev re dest bi  
xwari-

na wê tozê dikirin. Ji vê kêfê xweştir tu tişteki din tune bû. Bi vê  
kêfxweşiya ko em ê gemarê bi wan bidin xwarinê me digot:

— Xwe li dor tozê bicivînin û weziyeta xwarinê bigirin.

Girtiyan hema zû bi zû xwe li dora zibil didan hev dibûn weke  
bazinekî

li dora wê, çongên xwe didan erdê, devê xwe nêzîkî zibil dikirin û li  
ben-

da emirê din radiwestiyan.

Dema me li wî halê wan dinerî ji kêfa, em mest dibûn. Me bawer  
dikir

ko tu kes nikare bi me, ji me mezintir tu kes tune. Kes nikare tu  
tişteki

ji me re bêje, ji ber wê jixwebawerkirina di wê demê de bû ko min  
dixwest, tiştên weha bînim serê malbata xwe û dost û hevalên xwe.

Ji ber

hin bûyerên weha mejiyê me hatibû şûştin ev tiştên weha ketin  
jiyana me

ya sivîltiyê jî. Ma ne ji ber vana bûn ko ez ji alî herkesî de, dîn  
dihatim

naskirin ko di eslê xwe de tu dînbûna min tune.

Emirê xwarinê me dida û digot:

— Bixwin!

Wan dest bi xwarina Tozê dikirin. Bixwe ha bixwe. Wan dixwar em  
dikeniyên Me hin dişibandin çêlekan, hin dişibandin, bizina û hin jî

dişibandin mîhan. Girtiyan carekê her tiştên xwe xistibûn destê me,  
êdî

wan bixwesta jî nikarîbûn bêemiriya me bikirana. Em li ser serê wan  
dis-

ekînin. Me carna li wan dida, carna jî tinazê xwe bi wan dikir. Ma  
tenê

xwarina wê tozê. Na, na piştî qedandina tozê, wan ew erdê ko çop  
lê hat-

ibû rijandin jî divê bi zimanên xwe paqij bikirana, piştî bi zimanan  
paqijkirina erdê, wan digot:

— Emirê te hate cih komutanê me.

De werin vê ecêbê, him toz, dixwarin, him bi zimanên xwe erd paqij  
dikirin û dû re jî digotin:

— Emirê te hate cih.

Her dem yuzbaşiyê me ji me re digot »Kurên min, hûn nikarin van  
mirovan bi lêdanê bîn in rê, li gel lêdana wan, pêwîst e ko hûn di  
warê

pisîkolîjîk de jî wan têxin rewşên nebaş, ko bêmoralî têkeve nava  
wan ko

ew hîn zûtir, têkevin destên me. Loma me jî her cûreyên lêdan û  
işkenceyên pisîkolojîk bi kar dianî.

Carna me şibake vedikir, girtî radibûn, me lê dixist û em diçûn, bi  
sae-

tan şûn de nedihatin, pêwîst bû ew weha li benda me bisekinyana  
ko

113

GARDIYAN

heta me bigota »rehet«. Tu karî bêje ko çima hemû girtî radibûn ser xwe.

Ez vê jî ji te re bêjim, dema me gardiyanan ew şibaka di derî de vedikir,

gelek gardiyanên din diçûn xwe didan ber wan şibakên di dîwêr de û li

girtiyan dinerîn, kesekî ko raneba an jî neketa sekina nîzamî ji alî wan

gardiyanan de dihatin dîtin, ew kes an kesan dihatin tespîtkirin û em

diketin hundir, gardiyanê qawîşê digot, »ew kesên ranebûne ser xwe bila

derkevin der«, ma gelo mêr hebû ko derneketana. Derneketina wan du

alî bû, yek, eger ew derneketana hemû qawîş dihatin cezakirin, ya dudiyar jî ew bi cezayekî hîn girantir dihatin cezakirin. Me bi vî awayî

herkesê girtî fêrî xwedî li sûcê xwe derketinê kiribûn.

Carna jî me kesên ko alîkariya me dikirin, yanî li gor gotina, ew kesên

xwefiroş, re digot ko »binerin em ê îro werin şibakên qawîşa ko tu lê ye

vekin, divê tu ranebe ser xwe, dema me gazî jî kir, tu dernekeve derve ko

em hemû qawîşê cezabikin« Ew kesên alîkarên me jî, fêrî fêlbaziyên me

bû bûn, piştî lêdana qawîşê me ew kesên weha dibir, mutfaxê, li wir xwarin û çay dida wan.



Piştî plankirina vê fêlbaziyê, em çend gardiyan diketin ber deriyê qaw-  
işê û me çendan jî di şibakên diwêr re dinerî, me yekî jî şibaka di derî de  
bi hêl vedikir, ji bilî mirovên me, herkes radibûn ser nigan, lê ew kesên  
me ranedibûn, me derî vedikir, em çend gardiyan diketin hundir gazî  
dikir:  
— Ew kesê ranebû ser xwe bila derkevin.  
Kes dernediket, me xwe hêrs dikir, çend fort dikir, lê dîsa kes dernediketin, îcar me qawiş dixiste rêza lêdanê. Ji bona lêdanê me, dido-  
dido- sê-sê derdixistin derve û lê wan dida. Me ew kesên xwe yên xwefiroş  
dihîşt dawî yê, dûre ew jî derdixistin, xwarin û çaya wan dida wan û weke  
me lê da be, bi axîn û waxîn diketin hundir, lê ez wer bawerim ko hemû  
girtiyan bi kesên weha dizanîbûn, lê nikarîbûn tu tiştê bigotana.  
Êvaran piştî serhejmaran, me deriyê qawişan kilît dikir û kilîtên deriyan didan îdara girtîgehê. Ji ber ko di wê girtîgehê de kesî baweriya xwe  
bi kesî nedianî, herkes ji hev bi tirs bûn û bizdonekê me yê mezin jî yuzbaşî Esat bû. Sawa girtiyan her dem di dilê wî de bû. Di nava me de  
bêbawerî û di nava girtiyan de jî qasî ko me fam dikir baweriyeke xurt

hebû, ji xwe tiştê ko em pê nerehet dibûn, ev bû. Ji xwe girtiyên wir  
bi  
saya serê wê baweriya di nava xwe de zû bi zû nediketîn û baweriya  
wan  
qels nedibû. Di girtîgehê de pir hewldan hatin kirin ko em  
bêbaweriyê  
têxin nava wan, em toximên bêîtifaqiyê di nav wan de belav bikin.  
Me  
114  
GARDIYAN

gelek caran ew berra hev didan, me gelek caran tiştên ne rast li ser  
navên  
hevalên wan digotin û gelek caran jî me weha li wan fikir ko li ber  
hev  
bisekinîn û bi sîlan li hev xin. Lê dîsa bi hev re qisedikirin, dîsa di  
nava  
wan de hezkirin, berdewam bû. Qedr û qîmeta wan li hemberî hev  
hebûn. Wan bêhurmetiya hev nedikirin. Lê em ne weha bûn, em ji  
bo  
çend parî nanê xweş û ji bo çend quruşên heram bû bûn yek. Ji bo  
men-  
feeta şexsî me li girtiyan dida, ew birîndar dikirin. Hin jî ji ber lêdanê  
me  
hatin kuştin. «ro, tu halê min dibîne, ez weha bawer dikim ko ew  
kesên li  
wê girtîgehê gardiyan bûn, mirov dikare bêje, hema hema hemû  
weke

min in. Lê ew girtiyên wê girtîgehê ne weha bûn, wan ji hev hezdikirin,

wan bawerî bi hev dianîn».

Dema wî behsa, êvaran û kilîtkirina deriyên kir, rewşa hevalê Yusuf kete

bîra min, ko ew cixarqêşekî qawîşa me î sereke bû. Ew ji nên bêtir li cixarê

difikirî. Rojekê piştî serhejmara êvarî bû, ko êdî dema razanê hêdî hêdî

dihat, me hina kincên xwe datanî û hina cixare dikişand. Ji ber ko piştî

serhejmara êvaran mirov dikarîbû cixareyekê an jî dudiyan bikîşîne. Lê

cixarekêşên me yê qawîşê heta sê û çaran jî dikişandin. Hin hevalan

haziriyên xwe ê razanê dikirin û kesên nobedar jî hêdî hêdî xwe ji nobetê

re hazir dikirin. Lê hay û bala hevalê Yusuf ji tu tiştî tune bû. Ew tenê bi

cixara xwe ve mijûl dibû, wî weha ecele dikir, ko ew bikaribe, heta dema

razanê çend hebean bikîşîne. Di wê lez û bezê de xwe ji bîr kiribû, çû bû

ser nivînê xwe. Him kincên xwe ji xwe dikir, him jî cixare di devê wî de-

bû. Ma kê dizanîbû ko wê gardiyan hîn li ber şibakan rawestiyayî bin. Tu

nabê wan qawîş kontrol dikirin, dema ew çav li wê rewşa hevalê Yusuf

ketin, kêfa wan weke kêfa gurê ko nêçîra xwe bi dest xistibe, hatibû, lo-

ma wan şibaka di derî de vekirin û gazî kirin:

“Ew kesê ko li ser nivîna cixare dikişand bila were vir!»

Hevalê Yusuf qet bawer nekir ko gardiyana ew dîtine, loma ew derneket û xwe rê gardiyan neda. Piştî çend dengdanekî din, gardiyan

mêze kir ko kes neyê, ko ew wî nas bike, loma wî bi hêrs got:

“Ez ê sibê vî hesabî ji we bipirsim. Got û bi şidet şibake girt û çû.»

Ew çû lê bû gupe gupa nava me. Tiştên ko wê bihata serê me an jî yê

hevalê Yusuf diyar bû. Em weha bi awayekî xemgîn û bi tirs razan, ji xwe

razana me jî çî razan bû, dema çavê me dihat girtin, îcar di xewnên xwe

de ya me lêdan ji destê polîs û leşkera dixwar, yan jî em ji ber wan dire-

viyan û ew bi çekên xwe li dû me bûn. Bi bankirina nobederê serê sibê,

115

GARDIYAN

em rabûn ser xwe, me kincên xwe li xwe kir û haziriyên xwe ê din jî tamam kirin. Dûre me hemû hevalan ji hev re gotin ko »Hevalno ji bo

bûyera do êvarî, gardiyan wê li me mana bigerin. Ji bo vê yekê divê em îro

her tiştên xwe ji yê her roj baştir bikin, weke meş, xwendina sirûda ûhw«

Hîn em weha bi awayekî dizî bi hev dişêwirîn gardiyanê me qerewane anî

ber derî û qêriya:

— De taştîya xwe bixwin û piştî serhejmarê em ê hesabê do êvarî ji we

bipirsin, diyar e hûn hîn baqil nebûne. Got û çû, lê wer xwuya bû ko ew

gelekî hêrs bû bû. Qawişa wî bêemiriya gardiyenekî kiribûn. Ev jî ji bona

wî kêmasî bû ko wî hîn qawişa xwe neaniye rê.

Piştî serhejmara serê sibê, di demek gelek kurt de, deriyê qawişa me

hate vekirin, gardiyanê me li pêş û li dû wî jî çend hebên din. Ew gardiyanê şevê ko dîtibû hevalê Yusuf li ser nivîna cixare kişandibû, hate

ber nivînê wî, bi dengekî berz û bi kêf got:

— Kî li vêderê radizê (Bi tiliya xwe nivînê Yusuf îşaret kir).

Hevalê Yusuf du gav avît pêş, berê silava nigan, dûre ya serî û dûre jî bi

awayekî gelekî berz komûta xwe da.«Yusuf Diyarbe...» Hîn komûta wî

neqediyabû gardiyan kulmek li ser çavên wî danî, bi danîna wê kulmê re,

hevalê Yusuf li erdê rast bû. Ne dev û çav. Xwîn ji pozê wî herikî.

Gardiyana weha fam kir ko hevalê Yusuf mir, loma gardiyanê me bi awakî hêrs ji wî gardiyanî re got:

— Te ew kuşt, peyva me ne weha bû.

Em wer bawer bûn ko ew peyv bê hemdî ji devê gardiyanê me derket,

ji ber ko wan tu carî li ba girtiyan, kêmasiyên xwe nedigotin û em wer

bawer bûn ko ew kesên ko gotineke ji devê xwe derxista wî jî qasî me lê-

dan dixwar.

Wî gardiyanê ko li heval Yusuf dabû, bi awirekî tûj li gardiyanê me mêze kir û çend pêhînên din li erdê li hevalê Yusuf da û got:

— Cezayê, cixarekişandina ser nivînan weha ye, eger hin mêrên din hebin ew ê jî li ser nivîna cixarê bikşînin.

Ew derketin çûn, ji me re jî hevalemî mirî hiştin, me hîn nedizanîbûn ko rewşa wî çawa ye, bi derketina gardiyanan, em li ser serê heval civiyan,

me hina av li ser çavên wî kir, me hina canê wî difirkand. Di qawişa me

de hevalemî me î nivdoktor jî hebû, wî li damara heval nerî û got:

— Hevalno metirsin dijî, lê ez bi xwe jî nizanim bê wê dûre çawa bibe.

Bi peyva hevalê me yê doktor, em kêfxweş bû bûn, ko hevalê Yusuf ne

mirî ye. Ew bi xwe jî qasî sê-çar rojan di nava nivînan da ma û dûre bê se-

116

GARDIYAN

qetiyakê rehet bû, wî jî weke me dest bi meşê û xwendina sirûdên  
leşkerî

kir.

Eger mirov rastiyê bêje, em yek jî ji nexweşiyên rehet nedibûn, lê bi  
hukmê lêdan û sitresê, me her gav xwe weke mirovên saxlem didît,  
loma

jî em li ser nigan disekinîn.

»Yuzbaşî weha li me kiribû ko em bû bûn weke mirîdê vî.. Wî jî ev  
rewşa

me baş dizanî bû loma digot:

— Kurên min, divê êdî hûn wan destê xwe yê hêja û delal, wan  
destên, komunist û kurtçiyên tîne rê, zêde newestînin, ji bona vê  
yekê jî

divê êdî em kûçikan di girtîgehê de xwedî bikin û dema pêwîst bû,  
hûn

dikarin tenê kûçikan berra girtiyan bidin. Ji xwe qîmeta girtiyekî,  
weke

ya kûçikekî jî tune bû.

Em her dem di bin kontrol û agahdariyên yuzbaşî de bûn. Her çiqas  
em serbest bûn jî, lê bêyî wî tu tişt nedihat kirin. Tenê yuzbaşî  
serbestiya

ko em li girtiyan bixin da bû, wî serbestiya ko em bişkokên ber xwe  
vekin

da bû, wî serbestiya ko em pereyên girtiyan bidizin da bû û wî  
serbestiya

ko tiştên kantîne biha bifroşin da bû. Serbestiya me ev bû, bi tiştên  
vala

çavên me girêdabû, bi tiştên weha her daxwaza xwe bi awayekî ko wî

dixwest pêk dianî.

Dema wî digot ko »ji bona hûn zêde newestin, em ê kûçikan xwedî bikin« me bawerî pê fikir ko ew, li me difikire. Lê di rastiya xwe de ne we-

ha bû. Me dest bi xwedîkirina kûçikan kir, Û me ew fêrî ko ew jî weke

me bibin dijminê girtiyan, dikirin. Me gelek caran kûçik li ser serê gir-

tiyan diceriband ka bê, fêr bû ye, ya ne.

Piştî çendaekî, xwedîkirinê kûçik, wer gîhiştin ko êdî dikarîbûn êrîştî ser

girtiyan bikin. Me bigotina »Co« û kesek îşaret bikira, wî xar dibir ser gir-

tiyî ko me îşaret fikir, eger girtî bireviya, ew bê birîn xilas nedibû.

Carna jî em li qawîşan digeriyan û hin kesên ko berê berpirsiyariyên wan î rêxistinî hebûn, dineqandin û ew ji bona xwedîkirin û nerîna kûçikan, dikirin berpirsiyarê. Ew kesê ko ev qebûl nekira me lêdaneke di-

jwar lê fikir ko heta ew vê wezifa muqades qebûl bike. Hina qebûl nekir

lê hina jî bêyî ko em lêdaneke qenc li wan bikin, gotin:

— Baş e, qomûtanê min, ez dikarim li kûçikan mêze bikim.

Ew kesên ko berê li mirovan mêze dikirin, rêberê wan bûn, îcar di girtîgehê de, li kûçikên me mêze fikir, bin wan paqij fikir, serê wan dişûşt û xwarina wan dida ber wan. Êdî piraniya dema wan bi nerîna



## GARDIYAN

kûçikan derbas dibû.

Kêfa yuzbaşiyê me ji vê yekê re dihat ko wî kûçik bi wan kesên berê berpirsiyarê rêxistina bûn dida xwedî kirin. Bi serbilindayî, ji hin girtiyên

ko hîn teslîm ne bû bûn re digot:

— Hûn hîn lêdanê dixwin, lê berpirsiyarê we, weha hatine rê ko êdî ew

li kûçikên me mêze dikin.

Jî bona ko girtî ji vê gotara me bawer bikin. Me car carna navên wan kesên li kûçikan dînêrin, digot in. Carna jî me ew dibirên cihekî ko ew bi

çavên xwe li berpirsiyarên xwe yên berê binerin, da ko ew jî zû xwe tes-

lîmî me bikin. Tiştên dizanin, bêjin. Vê yekê tesîr li gelek girtiyan kir û

hin ji wan bi saya berpirsiyariyên wan î rêxistina yên berê, ko li kûçikan

mêze dikirin, xwe teslîmî me kirin«.

Dema gardiyan behsa kûçikên di girtîgehê de kir, ew rewşa ko roja avukatê min hatibû û gardiyan banî min kiribû ko ez û avukatê xwe hev-

du bibînin, hate bîra min. Wî, ez derxistim derve. Bi meşa komando û

xwendina sirûdên leşkerî û bi lêdanê min xwe gîhand hetanî cihê hevdît-

inê. Di kabîne de avukat li benda min bû, li ba wî dido û li ba min jî

gardiyane me hebû. Ji xwe tu tiştêkî ko em zêde biaxifiyana tune bû.

Gelek tiştên giring hebûn, lê me newêrbûn wana li ba gardiyana bêjin,

qise bikin. Loma hal û xatir, dûre jî bi çend pirsên basît me ziyareta xwe

qedand. Ê ez li qawîşa xwe vegeyriyam, gelo ew kesên biçûna dîtina avukat

û lêdan nexwarana hebûn. Na, ez bawer nakim ko ji bilî wan kesên xwe

firoş tu kesek hebe. Rewşa min jî ji ya wan hevalên ko lêdan dixwarin ne

cûda bû.

Belê çi bû di vegeyriyê de bû, dema ez û gardiyane xwe em ketin salona

mezin li wir gelek gardiyan jî sekinî bûn. Ez weha tê gihîştim ko ew ji

bona kesên tîn dîtina avukatên xwe li wir rawestiya bûn. Lewra dema ke-

sek ji cihê ziyaretê vedigeriya ew gardiyane din ko li wê salonê sekinî

bûn, tinazê xwe bi wan (kesên ko dihatin dîtina avukat) dikirin. Hina ji

girtiyan re digot in »bisekine« hina digot »rûnê«, hina digot »razê« ma kê

karîbû ji xeynê gardiyane xwe bi ya wan ê din bikirana. Weke hatibû di-

yarkirin ko gardiyanan bi vî awayî dixwestin ko meriv xwe şaş bike  
ko ew

jî lêdana xwe bikin. Min jî weke her hevlekî bi ya tu gardiyanê din  
nekir

û piştî çend gava kûçikê yûzbaşî, ê bi navê »Co« bi berçavê min ket.  
Tirseke ez girtim ko ew ê »Co« berra min bidin, hîn ez di vê tirsê de  
bûm,

gardiyanê me, ji min re got:

118

GARDIYAN

— Bireve!

Ez mecbûr bûm ko emirê wî pêk bînim û reviyam, dema ko ez  
reviyam

hema »Co« yê yuzbaşî ji paşiyê de bi nigê min girt,. Heta ko ez  
sekinim

wî xwîn bi ser nigê min de anî. Dema »Co« bi nigê min girt ez li cihê  
xwe

sekinîm, gardiyan kir û nekir, ez ji cihê xwe ne lebitîm. Lewra min  
zanîbû

ko dema ez xwe bilivînim wê »Co« ye nigê min perçe bike. Loma ez  
bi lê-

dana gardiyan razî bûm û min xwe nelivand. Dû re gardiyan gazî  
»Co«

kir. Bi halekî xerab, ez û gardiyan em hatin ber deriyê qawişa me.  
Wî derî

vekir û ez delkdam hundir û got:

— De bimire, kurê kerê.

Hevalên ko çav li vê rewşa min ketin, hema reviyana pêşiya min, wan bi min girtin, ez danîm ser nivîna, pantolênê min ji min danîn, çi bibînin, meraqa wan zêde bû û gotin:  
— Heval çi bû ye?  
Min ji wan re ew bûyer şirove kir û got:  
— Hevalno, meraq nekin, ev tiştê hate serê min dikare were serê we hemûyan, divê ji îro pê de em xwe ji vê re jî amade bikin.  
Belê bi vî halê xwe yê birîndar, li gel meşa komando û li gel sirûdan, gardiyan ez anîm hetanî qawişê. Wan bi zanetî kiriyarên weha dikirin ko em û avukatê xwe hevdu nebînin. Em ji mafê xweparastina li dadge-  
hê dûr dixistin. Wan baş dizanîbûn ko her hevdîtineke me û avukat, ji bona xwe hazirkirina dadgehê alîkariyeke baş bû. Wan nikarîbûn bi eşkere bigotana ko bila avukatê kesî neyê. Lê bi lêdaneke weha, gelek kes êdî nema diwêrîbûn biçûyana hevdîtina avukat,  
»Ji ber wê lêdana me ya keteber, gelek girtî seqet mabûn, kesekî ko qis-  
metê xwe ji lêdanê, negirtibana tune bûn. Ji ber ko me, gelek kes di wê girtîgehê de seqet hiştibûn. Bi wan kesên seqet meş ne dikirin. Dema qawiş derdiket derve, kesên seqet li hundir diman. Ji bona kesên di

hundir de diman, xwe rehet nekin, ew jî ji lêdanê bê par nemînin,  
em  
çend gardiyan diketin hundirê qawîşan. Ew kesên seqet an jî dereke  
wan  
şikestî, radibûn, diketin sekina nîzamî, hin kes ji ber seqetiyên xwe  
nikarîbûn, bi awayekî nîzamî rawestiyana. Kesên weha têra xwe  
lêdan  
dixwarin. Li wan kesên seqet jî weha hatibû ko wan dixwestin li  
derve  
meşê bikin û di dema derketina hevalên xwe de li hundir nemînin«. Dema wî behsa kesên seqet kir, rewşa Xalê Seîd kete bîra min. Em  
li

119

## GARDIYAN

derve bûn û me meşê fikir, sirûdên leşkerî dixwendin, lêdan û  
tinazên  
gardiya ji ser serê me kêr nedibûn. Di bin wê tava germ de  
qederê du  
saetên me qediya bûn ko gardiyanê me em xistin hundir. Em ji hal  
de  
ketibûn, bi ketina hundir, ji me hin reviyên towaletê, hina xwe dane  
erdê,  
hîn bîhna me baş nehatibû ber me ko dîna me dî Xalê Seîd dinale.  
Xalê  
Seîd ji qezayeke Mêrdînê bû. Temenê wî li dora 50 salî bû. Ji ber  
temenê

wî gardiyanê me ew dervedixist meşê. Xalê Seîd li gel çend hevalên seqet

di demên meşê de li hundir dima. Bi wî dengê Xalê Seîd em çend kes ber

bi wî çûn, dîna me dît ko xwîn ji nav şeqa wî tê, me rewşa wî meraq kir û

me ji wî pirsî:

— Xalê Seîd, çi bi te bû ye? Ev çi halê te ye?

— Qet nepirsin!

— Çawa dibe ko em nepirsin Xalê Seîd, de ka bêje, ev çi halê te ye?

Êdî xalê Seîd dest pê kir:

— Piştî derketina we, Çawişê bloka li gel çend gardiyanên din hatin hundir, em ji ber wan rabûn, ketin sekina nîzamî, ew hatin ba min gotin:

— Kesên ko hîn dixwazin nerehetiyên bikin, an jî li me guhdarî nekin hene?

Min got:

— Na, qasî ko ez pê dizanim her kesên vê qawişê baş in, her emirê ji alî

gardiyanan tene dayîn, pêk tînin.

— Kesên ko li dijî me propoganda dikin hene?

— Na, qomûtanê min

— Kesên ko hîn daw û doza komunistiyê an jî kurtçitiyê dikin hene?

— Na, komutanê min.

Çend pirsên din jî yên weha ji min pirsîn. Min jî bersivên li gor xwe dane wan. Lê baweriya wan bi min nehat, berê çawiş çend kulm danîn

min, dûrê dîsa pirsên xwe domandin.

— Baş e, kî ye ko yê li vê qawişê emirê biryarên siyasî dide?  
— Wele ez nizamin komutanê min.  
— Naxwe tu nizane ha! Tu jî ji wan e ha! De ka her tiştê vê qawişê  
ji me  
re bêje. Eger tu vê neke em kîrê te (mêraniya te) jêkin. Min got:  
— Di emirê we de ye komutanê min, lê bi rastî jî ez tu tiştêkî  
nizanim.  
Ez kesekî kal û di halê xwe de me. Ez ji danûstendina wan tu tiştêkî  
fam-  
nakim. Çawiş domand:  
— Derewa meke, ya na tu zanî wê çi bê serê te.  
— Wele ez derewa nakim komutanê min.

120

GARDIYAN

Werhasil wan tu tiştêk ji min fam nekirin, têra xwe li min dan, dûre  
jî  
çawiş şîşek ji bêrîka xwe derxist û xiste hundirê mêraniya min, tê de  
bir û  
anî ev xwîn ji wir tê.  
»Me di girtîgehê de, dereke kê bişkanda, pêwîst bû ko ew kes,  
sedemê  
şikandina pî an serê xwe, negota ko »gardiyane min li min xistiye,  
loma jî  
vir şikest« gotineke weha di girtîgehê de qedexe bû, pêwîst bû  
kesên we-  
ha bigotana »Ez ji ranzayê ketime û vira min şikest« ji ber ko carna  
kesên

mafê mirovan diparastin an ji hin Radyo û TV dihatin, dema wan pirs

bikira lazim bû, ko girtiyan weha bersivên wan bidana. «car, car carna me

ew kontrol dikirin ko bê hela kesî xwe ji bîr kiriye ya na. Em diketin qaw-

işan kesekî ko dereke wî şikestî re digot:

— Kurê min çi bi vir te hatiye?

— Komandanê min, ez ji ranzayê ketim û vêderê min şikest.

— Kurê min lêdan li vir heye?

— Na, komandanê min na.

— Kurê min gelo vir çi ye?

— Vir dibistan e, ew dibistana ko ji bona me girtiyan hatiye vekirin û

em di vir de dersên baş digirin.

Bi gotinên wan î weha kêfa me dihat, ji xwe mêr tunebûn ko li dijî wan

bêjeyan tişteki din bigotana. Ev bêjeyên weha, me bi hemû girtiyan dabû,

ezberkirin.

Di qawişekê de ji ber lêdanê girtiyek ketibû rewşeke nebaş, em ji rewşa

wî tirsîyan. Loma me doktor anî da ko li wî binêr e. Li gor rewşê hinek

derman bidê. Em ketin hundir, doktorê me çû ber serê wî kesê birîndar,

weha lê mêze kir û pirsî:

— Kurê min, çi bi serê te hatiye, ewqasî şikestiye?



— Komutanê min ez jî ranzayê ketim.

— Tu ji kîjan ran

zayê ketî?

Girtî ranza qatê binî rê doktor da got:

— Ez ji vir ketime, komutanê min

Ev gotina girtî him ne li gor dilê me û him ji ne bi dilê doktor bû. Ji ber

ko kesê ji ranzê yek qatî bikeve tu tiştêk pê nayê. Ji xwe piraniya doktorê

girtîgehê, zilamên îdarê bûn, wan jî weke me tade û zordarî li girtiyan

dikirin. Dema doktor mêze kir ko girtî bersiveke ne qenc da, loma wî

xwest ko vê yekê rast bike û got:

121

GARDIYAN

— Na, kurê min na, qey nayê bîra te ko tu ji ranzê qatê dudiyan ketiye.

Li xwe baş mêzeke û careke din ji ranzê nekeve.

Girtî bi awakî zû bi zû xwest wê şaşiya xwe rast bike, loma hema wî got:

— Belê, belê, komutanê min, rast ez ji yê jor ketime, lê ji ber êşa xwe ez

nizamin min çî gotiye.

Me jî hema li wir bi awirên sert ew tehdît kir û li benda derketina dok-

tor rawestiyan. Ji ber ko doktoran digotin ko »dema em hazir bin,  
tucarî

li girtiyan nedin« Piştî çûyina doktor, me ew kesê nexweş û serê wî  
şikestî,

xiste rewşeke din, ko êdî ew doktor nexwaze«.

122

GARDIYAN

XVIII

»Êdî derdekî nuh û işkenceyeke taybetî dest pê kiribû. Gelek  
daweyên

girtiyan hatibûn vekirin, girtî êdî divê biçûna dadgehê. Birin û anîna  
wan, ne ewqasî rehet bû. Gelek kes hebûn ko bi salan di wir de  
razabûn,

gelek li benda vekirina dawên xwe bûn ko vebin. Loma carna gelek  
kesan

ji me re digotin »komutanê min, dema dawa min vebe, ez ê bême  
berdan,

tu sûcê min tune ye« Lê me ji tu kesî bawer nedikir. Girtiyan dizanî  
bûn

ko di encama dadgehê de wê gelek bêne berdan. Bi hêviya ko wê  
bêne

berdan, li benda dawavekirina xwe dîpan.

Ew roj jî hat, wan tu carî bawer nedikirin ko di wê rojê de jî em ê li  
wan

bidin û işkenceyan bi wan bikin. Ew difikirîn ko hema dawa wan  
bête

vekirin, her tişt xilas dibe. Lê ne difikirîn ko yuzbaşiyê me jî li benda  
veki-  
rina daweyên wan bû û di demên hatina îddîanemeyên wan de wê  
çi bi-  
hata serê wan. Tenê wan dixwestin ko rojekê berî rojekî dawayên  
wan  
bête vekirin.  
Dema îddîanemeyên girtiyan dihat girtîgehê, berî ko girtî wan  
bibîne,  
îddîanameyên wan ji alî yuzbaşiyê me Esat ve dihatin xwendin. Wî  
ew  
kesên rêxistin damezrandibûn, ew kesên ko leşker an jî polîs  
kuştibûn,  
navê wan yeko yek li ba xwe dinivîsî, piştî ew kesên weha, wî bi  
xwe li  
girtîgehê mahkeme dikir, li wan dida, îşkenceyên gelek ecêp dianî  
serê  
wan. Ew girtiyên di rewşên weha de tenê du rê li pêşiya wan hebûn.  
Ya  
ew ê daxwaza yuzbaşî pêk bianiyan û tiştên ko wî dixwest  
binivîsandina,  
ya na jî ew kes we di wirde bihatana kuştin. Ji bilî van her du rêyan  
tu xe-  
lasiya ko kesên li girtîgehê dihatin mahkemekirin tune bû. Bi saya  
sede-  
ma dawavekirina girtiyan yuzbaşî hin kesên bi cezayê mezin dihatin  
îthamkirin xîste bîn îşkencên taybetî ko kesên weha her tiştî jî wî re  
bêjin.

Wî hin teslîm girtin. Wan daxwazên yuzbaşî pêk anîn û nivîsên xwe  
li gor  
dilê yuzbaşiyê me nîvisin. Ew kesên weha ji çendên tirsok pêk dihat,  
pi-  
raniyan kesên sûcê wan gîran li hember wê lêdan û êşkencêyên me  
bi wan  
dikir, radiwestiyan û tu tişt ji yûzbaşî re nedigotin, eksê wê li  
dadgehê her  
bûyerên ko me di girtîgehê de dikir li wir dîgotin.

123

GARDIYAN

Gelek girtiyên ko berê di nava rêxistinên xwe de berpirsiyar bûn,  
yan jî  
gelek kesên sûcê wan gîran bûn, yuzbaşiyê me ew ji qawîşê wan  
derdix-  
istin, dibir hucran, bi rojan li wir bê nan, av û cixare dihiştin. Dawiyê  
kaxezek dida wan û digot:  
— Binere mezinê vir ez im, ji min mezintir kes li vir tune ye û kes  
nikare têkilî nava karê min bibe, ez çî bikim dikarim, berdana te û  
ceza-  
kirina te jî di destê min de ye. Li gor ko min îddîanemeya te  
xwendiyê, bi  
kêmanî tu yê 30-40 salî ceza bixwe. Bêyî ko ez lêdanê li te bikim,  
ser-  
pêhatiyên xwe, karûbarê xwe yên rêxistinê yeko yek binivîse, di  
binê kax-

eza xwe de jî bêje ko »ez ji hertiştê ko min kiriye poşman im« Wê demê ez karim te bidim berdan. Na, eger tu tiştêkî weha nenivîsîne, tu zane ko tu ê nikaribi ji vir bi saxî derkeve. Êdî ez diherim. Dema te dest bi nivîsê kir, xebera gardiyana bighîne ko bila ew ji te re, çay, av û xwarina xweş bînin. De hadê êdî tu dizane, ya mirin yan jî azadbûna te, her tişt di destê te de ye. Ji herduyan yekê hîlbijêre. Bi rastî jî tiştê ko yuzbaşiyê me digot, pêk dianî. Hin kesan ji bona di wir de neyên kuştin, hin tiştên ko baweriya yuzbaşî pê dihat dinivîsîn, dema ew diçûn dadgehê ew tiştên ko di girtîgehê de nivîsîbûn, înkâr dikirin û digotin:

»Min ew tiştên nivîskî bi darê zorê nivîsiye û ji xwe hemû derew in, ji bona ko ez di girtîgehê de neyême kuştin, ji bona ko ez wan bûyerên di wirde dibin, bêjim min hin tişt nivîsîn, Niha ez di huzûra we de dibêjim, eger ez di girtîgehê de bême kuştin, qatilê min yuzbaşî Esat e«.

Belê me gelek kesên weha mêrxas jî di wê girtîgehê de dîtin. Hin mêrxas hebûn ko mirov li rewşa wan ecêbmayî dima, ne ji lêdanê ditir-

siyan, ne ji girtîgehê û ne jî ji yuzbaşî Esat. Lê hin kes hebûn ko nava wan ji lêdanê diqetiyen, ji xwe ew kesên weha bûne zilamê yuzbaşî û kesên weha bûn ko ji bona lêdan li wan neyê kirin »îtîrafa samîmî« dikirin. Hin ji wan kesan, êdî li dadgehê jî li hevalê xwe didan û ew bi her awayê bûne merivên yuzbaşî. Yuzbaşî jî bi her awayî li wan xwedî derdiket; Li girtîgehê kesên weha di jiyaneke taybetî de bûn, xwarin, vexwerina wan ji kîsê yuzbaşî bûn. Car-carna yuzbaşî ew ji girtîgehê derdixistin, bi ko de dibirin me pê nizanîbûn. Ew tiştên ko yuzbaşiyê me bi darê zorê, bi hin girtiyan dida nivîsîn, navê wê kiribûn »tîrafname ya samîmî« Lê ew bi xwe ne »îtîrafa samîmî« bû, ew bi xwe qebûkirina bi hukmê dar û jopan dihate kirin, bû. Di girtîgehê de, cihên cûda cûda ji bona lêdana girtiyan û gelek

## 124 GARDIYAN

medotên bi taybetî hebûn. Li gor sûc û cezakirina girtiyan me ew dibirin cihê ko cezayên wan dihate birîn. Weke; lêdana di hucran, ya qawîşan, û lêdana bi taybetî ya li sinema û hemamê ne weke hev bûn, li her cihekî

şiklekî lêdanê hebû.

Jiyana me ya di wir de bû bû weke jiyana kerr û lalan. Ne me dizanîbûn

ko em çî dikin û ne me rojekê devên xwe vedikir. Me her emirên ko ji alî

yuzbaşî de dihat pêk dianî û gelek caran jî ji bona aferîmekê me mirov se-

qet dihiştin. Ew aferîma ko me li girtîgehê digirt, li vir, yanî li jiyana me

ya siviltiyê de, li me bû weke pariyekî bijehr û di qirika me de ma.

Em ji her tiştên xwe bûn, ji dost û hevelan, dê û bavê xwe, xwişk û bi-

rayên xwe bûn. Lê rojekê ji rojan ne deweleta me, ne jî ew kesên di girtîgehê digot, ko her tişt ez im. Li me pirsîn. Kes nabêje »gelo ew kesên

li girtîgeha Diyarbêkrê gardiyan bûn, nîha halê wan çî ye«. Tu bi rastî bixwaze divê her kesekî ko li wê girtîgehê gardiyan bûn, ew kiryarên wan

bi xwe kirine, bêjin, bêjin ko êdî tu kesên din neyên xapandin, tu kesên

din jî weke me fikir, nekin. Ji ber derewên kesên li wir soz didan ko wê

her dem li me xwedî derkevin, di jiyana me ya siviltiyê de derket holê. Ew

kesên soz dabûn ko wê li me xwedî derkevin, ev yeka hanê pêk neanîn. Ji

roja qedandina me ya leşkeriyê de em hatin jibîrkin. Lê hin kesên weke

yuzbaşî, bi saya serê lêdana, ko me li girtiyên fikir, mezin dibûn,  
terfiyên  
wan î leşkerî bilindtir dibûn. Ma gelo rewşên weha wê heta kengî  
dom  
bike, em mirovên nezan, gelo heta kengî em ê bêne xapandin.«  
Gardiyan him digot û him dibû kufe kufa wî, soro moro bû. Min fam  
kir  
ko dema ew tiştên wî bi xwe kirine tê bîrê gelekî aciz dibe, nikarîbû  
êdî  
qisedana xwe bidomîne. Him cixare dikişand him jî di nava ramanên  
kûr  
û hûr de xwe wendakiribû. Hêstirên wî yên girover xwe ji çavên wî  
bera  
xwarê da, hêstirên wî di ser çenga wî re, herikîn ser sînga wî. Devê  
xwe  
vekir ko tiştina bêje, serê xwe hejand û di ber xwe de got: »Wax  
wax, xwelî  
li serê min be, ma min çawa kir, tifi û hezar tifi li min be«ji vê pêve  
tu  
tiştêkî din negot, rabû ser xwe, kete rê û çû. Qet ji min re tu tişt  
negot,  
min jî weha bi awayekî şaşmayî li rewşa wî mêze kir. Min jî ji wî re  
tu tişt  
negot, tenê heta ew jî ber çavên min wenda bû, min li wî nerî. Dû  
re ez  
rabûm ser xwe, min jî berê xwe da malê.

125

GARDIYAN



XIX

Ez serê sibê zû rabûme ser xwe. Min haziriya xwe kir û li benda gardiyanê

xwe rawestiyam. Ji xwe ji dema me hevdu dît û naskir vir de, êdî ez her

roj zû radibûm ko wî zêde nedim sekinandin. Lê îro rojeke gelekî taybetî

bû. Ez ji hatina wî di şikê de bûm. Min nema dizanî bû ko êdî ew ê bê ya

na. Lê dîsa jî min xwe ji bona çûyinê amade kir û li benda wî rawestiyam.

Lê ew ne dihat, tirsar min ew bû ko êdî ew ê neyê. Ez li ber şibakê rûniş-

tim û qet ranebûm û çavneriya wî dikir. Berî nîvro min dît, wa ye ew dîsa

di rê de ye û ber bi wî girê li hember nexweşxanê ve diçe. Dema ew hat

rastî mala me, li hundir mêze kir, dît ko ez li ber şibakê li rêya wî diner-

im, kêfa wî jî hat. Bi serê xwe îşareta, ko va ye ez diçim, tu jî piştî qederekê

were, da. Kêfa min jî hat, min haziriyên xwe kiribû, hema min tiştê xwe

girt, piştî ko ew ji ber çava wenda bû, îcar ez ketim rê. Dema min nêzîkayî

li cihê me yê her car kir ko ew li wir rûniştî bû, bi dîtina min ew rabû ser

xwe, hate pêşiya min tişt ji destê min girt û got:

— Ji bona do li min bibuhure, ez dizanim ko min bê ûsûlî kir, lê tu nizane ko çi kete bîra min. Dema ew tiştên ko min di wir de kirin hatin

bîra min, min nema dikarîbû xwe bigirta, min nikarî bû xatir jî ji te bixwesta û ji derengmayîna min î vê sibê re jî sedam ew bû. Di mala me

de bûyerek nebaş derbas bû. Şer di nava bav û birayên min de derket.

Birayên min ji mal xeyîdîn, bavê min li min mêze kir û got: »Ev tiştên ko

têne serê me, hemû ji rûçikê te ye,« Ev peyva bi min gelekî zor hat. Lê

tişteki ko ez bikim jî tune bû. Min xwest, herim û venegerim. Bi sergêjiyake weha ji mal derketim, min berê xwe da cihekî din, dereke ko

êdî ez jê venegerim. Lê tu kete bîra min, wê demê ez li xwe vegeriyam,

weke heft kes ji min re bêjin: »Lawo heta niha te tu tişteki baş nekiriye,

balo tiştên ko tu zani ji vî kesê qenc re bêje« û ez bi şûnde hatim. Min bir-

yara xwe da ko heta ez ji te re tiştên ko ez pê dizanim nebêjim, ez ê bi tu

derekê de nerim. Li min bibuhure em dest bi karê xwe bikin, wê baştir

be. Dest pê kir:

»Me her şikil û metodên lêdanê li ser girtiyan ceribandibûn, him ew êdî

126

GARDIYAN

fêrî lêdanê bû bûn, him jî em ji lêdana weke her ro aciz bû bûn. Ji ber vê

yekê bû ko me êdî tiştên çewto mewto dikirin. Weke piştî meşa derve de-

ma me qawîş dixiste hundir, îcar me yeko yek banî wan fikir ko ew werin

ber derî û komûtê bidin. Di dema komûtdanê de me dizanîbû ko dengê

kê ketiye û yên kê neketiye, ew kesên ko dengê wan neketibûn, derdix-

istin derve û lêdan li wan fikir ko çima dengê wan neketiye, lê hin mirov

hebûn ko ew çîqa biqêriyana jî dengê wan nediket, kesê weha bêtir lêdan

dixwarin û me ji wan re digot:

— Naxwe tu van sirûdên muqades naxwînî ha!

— Na komutanê min na, ji xwe dengê min nakeve, ez çer bikim jî nakeve. Digot.

— De wer li wî biner lo, tew ew min derewçîn jî derdixe, kuro!

Dema me kesekî girtî bi sûcekî sûcdar bikira, heqê girtî tunebû ko ew

îtîraz bike. Pêwîst bû ko wî tenê bigota »tu emir dike komutanê min« ji

bilî vê, gotineke din, sûcê wî girantir û mezintir dikir.  
Êdî weha li me gardiyana hatibû ko em gelekî tiral (tembel) bû bûn,  
ji  
ber ko em bi her awayî li ser serê girtiyan azad bûn. Tenê em di  
warekî de  
ne azad bûn, bê lêdana girtiyan me nikarîbûn li wê girtîgehê weke  
gardiyan bimana. Ji bilî vê me çî, çawa bixwesta, li gor dîtî û nerîna  
yuzbaşî, me dikir. Êdî ji dilva ko em girtiyan derxin, derve û bi wan  
meşê  
bikin, sirûdên leşkerî bi wan bidin xwendin, me di hundir qawîşan  
de, ev  
tişt, bêyî ko em biwestin, bi wan didan kirin.  
Serê sibehan pêwîst bû ko girtî, saet 06.00-an rabana ser xwe, rîhên  
xwe  
kurkiribana, taştêya xwe xwaribana û cixarekêşan jî cixarên xwe  
kişandibana ko heta saet 07.00-a di rêza esasî de, li benda  
serhejmara serê  
sibê rawestibana. Berî serhejmarê, ji alî mesûlê wan de divê »Sonda  
Me«  
dûre di cih de meş û bi dengê bilind jî sirûdên leşkerî bixwenda.  
Dema  
wan weha dikirin, me jî li kêfa xwe dinerî, çî dixwest ew dikir, car-  
carna  
jî me di wan qulikên di şibakên dîwaran de li wan mêze dikir, ko bê  
hela  
ew her tiştên ko em divên, nîzamî dikin an na.  
Pêwîst bû wan bi dengê gelekî berz sirûd bixwendana. Dema ko  
wan

hemûya di wî hundirê teng de û bi deng bilind sirûd dixwendin, zarê  
guhê gelean ji ber wî dengê berz diteqiyên û gelek bi vê sedemê  
kerr bû

bûn, hina jî aqilê xwe wenda kirinbûn.

Piştî ko me ev şiklê meş û xwendina sirûdan di hundir de dît, em êdî  
re-

het bû bûn. Serê sibê me emir dida, hetanî xwarina nîvro, piştî  
xwarinê

ev kar dîsa berdewam dibû. Me kar weha bi pêş de biribû ko êdî  
gelek

127

GARDIYAN

caran rojên şemî û yekşema jî me ev tişt dianî serê qawîşên cezakirî.

Ji ber

ko tişteki rehet bû, tenê me emir dida, kar êdî bi xwe dihate kirin.

Berê vê

keşifa delal, rojên şemî û yekşema me qet bi wan meş nedikir, lewra  
me ji

xwe re îstirehet dikir...

Me her roj ji girtiyan re bi pereyên wan, rojname û kovar dikirîn ko  
bi

sedema ew wan bixwînin, di dema dayina wan de û me weha digot:

»Divê yek rojname neyê qetandin, me çawa ev rojname dane we,  
pêwîst

e ko hûn weha li me vegeirînin«. Di vir de mebeste me ew bû, da ko  
ew

rojnameyan nexwînin, ya duda jî dema wan rojname bi awayekî saxlem

li me vedigerandin, me jî ew li cihê wan vedigerandin, yanî him rojname

dihat girtîgehê, him girtiyan nikarîbûn bixwendana û him jî me heqê wan, ji girtiyan distend û ji xwe re ew bi şûnde dida û perê wan careke din

digirt, yanî ev rewşeke weha bû ko ji me pêve kes nikarîbûn, ji nav der-

keta. Kesî nikarîbû bigota ko rojname nare girtîgehê, kesî nikarîbû bigo-

ta, girtî rojnama naxwînin. Ji ber ko me êvaran dida wan û serê sibê bêyî

ko yek hatibe qetandin, me bi şûnde digirt û li cihê rojnaman difroşe vedigerand. Me heqê wan him ji girtiya distend, him jî ji cihê rojnameyan.

Di nava wan rojnameyan de, me yê seksî jî dikirîn û didan girtiyan. Me wan rojnameyên seksî hema zû bi zû ji wan nedigirt. Me dîxwest ro-

jnameyên weha li girtîgehê hebin. Ji ber ko ew rojnameyên seksî çiqas di

qawîşan da bimana, ewqasî ehlaqê wan dihat xerakirin. Bi nerîna sûretên

keçikên tazî ehlaqê geleka nebaş dibû, bi sozdana ko ew bibin mirovê

yuzbaşî, hin soz ji bona kesên weha dihate dayîn. Bi saya serê wan kovar

û rojnameyên seksî me gelek kes kirin alîkarê xwe û zilamên yuzbaşî.

Rewşa lêdanê bi awayekî rêkûpêk heta sala 1982-an berdewam bû. Lêdan û îşkence qet kêr nedibûn, her ko diçû zêdetir û hîn jî firehtir dibûn. Ji ber wan lêdanên me êdî nav û dengê girtîgehê, him li Tirkîyê û

him jî li cîhanê hatibû belavkirin. Ji ber vê yekê car-carna hin heyetên,

mafê mirovan, yên Tirkan û hin jî ji derve dihatin. Ji bona ko yuzbaşiyê

me, wan progpagandên dihat kirin, bi awayekî nerast bide zanîn, wî êdî

lêdana fizîkî kêr kiribû. Her çiqas lêdana fizîkî kêr bû bû, lê li hemberî

vê, tadeya pisîkolojîk zêdetir bû bû, ji ber vê yekê ye ko li wê girtîgehê re-

hetî peyda nedibû û lêdan nediqediyan.

Ji bona ko em bikaribin, bi rehetî, wan komelên ko mafê mirovan di-

parêzin bixapînin, di girtîgehê de ji heftê rojekê, bû bû roja sporê.

Her

qawîş rojekê diviyabû, sporê bikin û bi topê bilîzin. Me bi pereyên gir-

128

GARDIYAN

tiyan ji bona her qawîşekê ji bo lîstika voleybolê top û tor da bû kirîn. Me

ji bo kirîna wan tiştan pereyekî gelekî zêde ji girtiyan standin. Di destpê-  
ka kirîna van de kêfa girtiyan hat ko ew ê êdî, bikaribin di nava xwe de bi  
topê jî bilîzin. Lê em ne weha difikirîn. Me êdî baş dizanîbû ko lêdana  
fizîkî ji bona girtiyan, ne pir zehmet e, ew jî êdî fêrî lêdanê bû bûn. Weke min got, me ji bona her qawişê topa voleybolê û tora wê da kirîn,  
rojên lîstina wan î topê jî me tiştên gelek ecêb dianî serê wan. Her cihekî talîme me torek lê girêdabû. Dema kesên heqê mirovan di-  
parastin, dihatin, çav li wê torê û lîstika girtiyan ya topê diketin, baweriya  
wan çêdibûn ko va ye, girtî dikarin topê bilîzin, spor ê bikin. Lê tiştên me  
dianî serê girtiyan, ji bilî me tu kesekî din pê nedizanîbû. Me li wan we-  
ha dikir:  
Di wê roja ko diviya bû, spor bihata kirin, me qawiş derdixist derve. Du  
taximê ji 12 kesan pêk dihat. Wan dilîst, lê çawa dilîstin. Pêwîst bû her  
dem di rewşa nîzamî de bana. Tenê dema top dihat cem wan dikarîbûn  
destê xwe rakirana û li topê bidana, dûre dîsa têketana sekina nîzamî. Li



dora xwe mêzekirin, bi dengê bilind gazîkirin, axaftina bi hev re  
ûhw.

qedexe bû. Kesî nikarîbû ji kesekî din re bigota »ka topê bavê vira«  
dema

kesî li topê neda, yan jî ew biketa, îcar me ew dibirin jor û lêdan lê  
dikir

ko ji bona çî xweş nalîze. Eger du kes bi şaşî li hevketana, herduyan  
jî lê-

dan dixwarin. Dî dawiya lîstikê jî me ew kesên ko zora yê din  
biribûn,

li hev siwar dikir û weha çend caran li dor saha topê dida bazdan.  
Lê ya

xweş ew bû ko dema me kesê him bi kîloyên xwe û him jî bi qelefetê  
xwe

giran û mezin, li wan kesên kêrî kuwet û yê biçûk dikir,  
manzarayeke

xweş derdiket, em ji kena diketin.

Ew kesên bi topê jî nedilîstin, wan nikarîbû, ji hevalên xwe re  
tezahu-

rat bikirina. Bi awayekî azad meş kirin û bi hev re xeberdan û cixarê  
kişandin qedexe bû.

Roja spora wan, roja îstîrehetê wan weha bû ko gelek caran wan  
nedixwestin ko derkevin derve û bi topê bilîzîn. Bi topê lîstin ji bona  
wan

ji meşê zortir bû.

Eger musada te hebe, em îro jî di vir de bisekinin, ez gelekî  
westiyam,

sibê ez ê ji te re tiştên hêjatir bêjim«.

Bi rastî ez jî gelekî westiyabûm, loma min li hember vê gotaina wî  
tu  
tiştêk negot, deftera xwe girt, qelema xwe kire bêrika xwe, bi wê  
rawes-  
tandinê ketim ramanên kûr û kûr nava wan bûyerên girtîgehê de  
çûm û

129

GARDIYAN

hatim. Ew bûyerên wir yeko yek dihatin berçavên min. Ew çî difikirî  
min

bi xwe pê nedizanîbû. Berî ko em rabin wî dîsa got:

— Hevalê hêja, pêwîst e ko tu sibê hinkî dereng were vir, heta ko tu  
bêyî ez ê hin hazirî bikim. Sibê wê rojêke taybetî be. De ka em îcar  
rabin,

bimîne di xweşiyê de û bi xatirê te.

Wî tu rojên din negotibû bi xatirê te. Min tu mane neda wê gotara  
wî,

ya din gelo çima ez ê dereng herim min ew jî nedizanîbû. Lê min  
nedixwest ko ez, zêde xwe bidim dest û ew bizanibe ez jî de dema  
wî de

girtiyakî wê girtîgehê bûm. Loma gelek caran, min hin tiştên ko wê  
min

bide dest ji wî nedipirsî. Gelek caran min bi ya wî fikir ko ew wan  
kir-

yarên girtîgehê ji min re bêje. Ma gelo firseta weha bi dest kê diket?

Min

ev firset bi dest xistibû, loma ez gelekî ji xwe agahdar bûm. Min her

hereket û axaftinên xwe bi kontrol dikir.

130

GARDIYAN

XX

Roja din ez dîsa zû rabûm, li benda dema xwe ya çûyinê rawestiyam.  
Dema ko ew derbas bû, li hêla şibaka ko ez li wir li benda wî bûm,  
nêhîrt,  
qet nekeniya û bi rûyekî tirş derbas bû. Ew derbas bû çû. Piştî wî bi  
qed-  
erekê yanî weke wî gotibû, li dor dema nîvro ez jî ketim rê, min berê  
xwe  
da wî girê li hember nexweşxanê û ketim rê û çûm. Li alîkî kêfa min  
di-  
hat ko ew ê îro ji min re tiştên hêja bêje, li alîkî jî ez bi xwe jî weke  
di stre-  
sekê de bûm. Min jî nizanîbû ko ev yeka han ji bo çi ye. Gelek tişt  
ketin  
bîra min. Him girtîgeh, him rewşa min î li vir, rewşa ko ez niha têde  
bûm,  
ne tu rewş bû. Rehetî û têrxwarina me tunebû. Pereyên ko hevala  
min di-  
girt, êdî têra me nedikir. Rewşa ko ez jî tê de bûm ne zelal bû, him  
min  
leşkerî nekiribû, him li alîkî din ez li welatê xwe her dem di bin çavan  
de  
bûm. Ne kar û ne jî îşê min hebû, weha aware aware ger jî, heta  
taliya

jiyana min wê ji min re neserifiya. Di van xem û xeyalan de, dema  
min  
nêzîkayî li cihê hevdîtînê kir, tiştêkî dirêj weke mirovekî bi darê de  
hati-  
bû daliqandin, kete ber çavên min. Bi dîtana wî tiştî ez fikirîm »gelo  
gardiyan xwest henekekê (surpirîz) bike, gelo ew çî ye?« bi van  
ramanan  
min gavên xwe hîn bi lez avît, bi bazdan xwe gîhand bin darê. Lê ez  
çi  
bibînim, dîtina min dît ko cesedek bi darê ve daliqandî ye. Min  
nêzîkayî  
lê kir, berê wî bi hêla xwe de zîvirand, çi bibînim. Gardiyanê min bi  
xwe  
ye, wî xwe daliqandiye. Bihna min teng bû, gurîzî girte canê min û  
ez  
gelekî aciz bûm. Gelo çima wî ev yeka kir? Gelo çima wî do ji min re  
gotibû ko »ez ê sibê tiştên hîn hêjatir ji te re bêjim?« Gelo çima wî  
xwest  
ko ez îro dereng werim vir? Naxwe hemû mesele ev bû? Gotina  
tiştên wî  
yên herî xweş, ev bû ko wî bi xwe, xwe daliqand. Berê ez jî şaşo-  
maşo  
bûm, lê min serê xwe rakir, li qelefetê wî mêze kir ko du name,  
xistine  
bêrîka çakêtê xwe. Dema min ew name derxistin li ser yekê  
nivîsandibû  
»Ji bo hevalê hêja Sîdar« ya din jî »ji bona bavê min«. Min ew  
nameya ko

ji bo min bû, min girt ya din dîsa xiste bêrîka wî. Bi lez hatim  
nexweşx-

anê, min telefonî qerekolê kir, rewşa wî ji qerekolê re got ko ew jî  
xeberê

bidin mala wî. Bi vî awayî her kesê herêmê pê agahdar bûn ko wî  
kesî

131

GARDIYAN

Îxwe bi dar ve kiriye, lê ji bo çî ye kesî pê nizanîbû.

Dûre ez vegeyam malê, min ew nameya ko wî ji bona min lêkiriye  
derxist. Destên min diricifîn. Min kir û nekir, nikarîbû, name vekira,  
Her çîqa zilm û tadeyê wî li kesên girtî û mirovên qenc hatibû jî, ew  
gelekî ji ber wan bûyer û kiryarên kiribû aciz bû, poşman bû. Lê wî  
nikarîbû vê poşmaniya xwe ji kesekî re bide îzahkirin. Loma ez jî bi  
xwe

ji bona wî bû bûm hêviyek, bû bûm alîkarê wî ko ew wan bûyerên  
ko di

girtîgeha Diyarbêkrê de kiribû, bêje û xwe rehet bike. Bi wê hêrs û  
ked-

erê rabûm ser xwe, min hinek ava cemidî vexwar, çayeke xwe da  
ser, dû

re cixareyeke xwe pêxist û min nameya xwe vekir û dest bi  
xwendina wê

kir:

»Hevalê hêja, Sîdar!

Ez weke hevlekî gazî te dikim, di rastiya xwe de tu heqê min tuneke  
ko

ez te bikim hevalê xwe, ji ber ko ez ne hêjayî vî tiştî me ko mirovekî  
qenc  
bikim hevalê xwe. Lê tu dîsa li min bibihure, ji bona vê carê min  
bibexîne. Ev dê cara min î dawîbe ko ez ê ji te re bêjim heval, ez  
hêvîdar  
im ko tê jî vê daxwaza min î talî qebûl bike.  
Hevalê hêja!  
Roja ko min tu nas kirî, kêfa min gelekî ji te re hat, tu û kesên weke  
te  
hûn hemû mirovên gelekî qenc in. Di destpêka gotina kiryarên  
girtîgehê  
de min tu nas nekir, piştî ko ez di nava bûyeran de çûm, êdî tu û  
rewşa te  
ya girtîgehê jî dihate bîra min, êdî min dîzanîbû ko tu jî di wê  
girtîgeha  
ko ez li gardiyan bûm, girtî bû. Ez weha bawer dikim ko te bi xwe jî  
gelek  
lêdan ji dest min xwariye, dema ko min ev rewşa te fam kir, min  
nedixwest tu zanibe ko min tu naskiriye, loma jî min xwest ew tiştên  
di-  
hatin bîra min bi qasî zanebûna xwe ji te re behs bikim. Dibe ko min  
gelek tişt ji bîr kiribe, dibe ko min gelek tişt negotibe. Tiştên min  
digot,  
yên esasî û temelê lêdanê û rewşa psikolojîk bûn. Tişteki din yê  
giring jî  
ev e ko her gardiyanek li ser serê qawişa xwe azad bûn, her  
gardiyanek

metodekî wî yê xas jî hebû, loma dikare kiryarên min û yên  
gardiyanên

din bi her awayî hev negirin. Ew tiştên min ji te re gotin, tenê min  
girê

didin û hemû rast in.

Dostê hêja!

Ez ê nexwazim vê nameya xwe dirêj bikim, tenê çend daxwazên min  
wê

132

GARDIYAN

hebin; eger tu van bikaribe pêk bîne, tê min di mezelê min de şad  
bike.

Weke tu jî pê agahdar bûyî, ko piştî çûyina min î leşkeriyê û  
qedandi-

na wê, malbata min tu rehetî ji destên min nedîtin. Min her û her  
tade û

işkence da wan. Wan di rûçikê min de gelek tiştên xwe wenda kirin.  
Ez

bûme sedama bêtifaqiya nava wan, bav û birayên min rabûn hev,  
diya

min ji derdên min û wan bûyeran tehamul nekir wefat kir. Taqeta  
bavê

min, weke berê nemabû, ew gelekî asabî bû bû, sedemên van  
bûyeran

hemû jî ez bûm. Min bi vê yekê dizanîbû, lê tiştêkî ko ez bikim jî  
tune bû,

min fikir û nedikir, nikarîbû xwe serrast bikira. Tiştên wê girtîgehê

hemû di serê min de bi cih bû bûn, di laşê min de şîn hatibûn, tiştên  
qenc  
ji dilê min derketibûn, yê nebaş ketibûn şûna wan. Tu weke  
mirovekî  
zana û qenc pê dizane ko di wan şertên girtîgehê de mirov dikeve  
çi halî,  
xwe ji wê rewşê xilaskirin, ne weha hêsan e.  
Loma daxwaza min wê ji te ev be ko tu tu carî navê min î rast li tu  
der-  
an nebêje. Eger tu, van bûyerên min ji te re gotin, li rojnama ko tu  
tê de  
kar bike biweşîne, ez ê kêfxweş bibim. Lê rica ji te dikim ko tu ê navê  
min  
nede, tenê bêje gardiyan. Dema tu nav û paşnavê min î rastî bide,  
mal-  
bata min, xuşk û birayên min, dikarin zerarên hîn mezintir bibînin.  
Ji  
xwe heta tu bixwaze min zerar dane wan, ji niha û pê de ez  
naxwazim ko  
qasî misqalê zerre, zerara min bighê wan.  
Dema ko min tu nas kir û pêde, ez hîn bêtir li ser wan bûyerên  
girtîge-  
hê difikirîm. Min dixwest ko ez qencyakê bi te bikim. Min dixwest  
ko  
ew bûyerên me gardiyanên wir dikirin, bêjim ko tu jî vana ji herkesî  
re  
bêje. Bila herkes rastiya wê girtîgehê bizanibin ko çima ewqas lêdan  
û



tade tê de dihat kirin. Ji ber ko min ev mebesta te famkiribû ko te  
her  
dem bala min dikişand ser bûyerê wê girtîgeha bi nav û deng, wê  
girtîge-  
ha ko serê gelek mirovên qenc xwar. Loma jî her êvar karê min ew  
bû,  
min tiştên wir dianî bîra xwe, min dixwest ko her tiştî, belê her tiştî  
ji te  
re bêjim. Lê tiştên ko hatin bîra min, yê min dizanîbûn ev bûn.  
Gelek  
kiryarên min bi xwe kiribûn, ji fediya min negotin, hin jî min xiste  
hus-  
tiyê hevalên xwe yê gardiyan.  
Em, ew gardiyanên di wir de, piraniya me cahil bûn, feqirbûn. Me  
gelekan ji tu tiştê fam nedikir, me nizanî bû, kurtçî çî ye, komunîst  
çî  
ye? Tenê li gor axaftina yuzbaşî her tiştê me dihate kirin, gotin  
gotina wî  
bû, kirin kirina me bû. Esasên plan û projan yê yuzbaşî Esat bûn û  
ew  
bi xwe jî ne mirovekî saxlem bû. Ew mirovekî kêş bû, roja ko wî  
venexwara, nikarîbû li ser xwe bisekiniya. Bû bû alkolist û xwe  
dijminê

133

GARDIYAN

kurdan bû. Tenê daxwazeke wî hebû. Kurdan bikuje. Wî rojê çend  
kes jî

bikuşta dilê wî rehet nedibû. Ji ber ko wî carna ji me re digot: »Dema her kurdek tê kuştin ez, salekê ciwan dibim«.

Min dixwest ko ez hîn gelek tiştên din ji te re bêjim, lê êdî ez ê nikaribim. Taqeta min ji ber wê bêtifaqî û ji hev belavbûna malbata min nema. Her ko bavê min li min mêze dikir, weke bêje »te dît te çî anî serê me, ev tişt hemû ji rûçikê te bûn«. Min bi xwe jî zanîbû ko ew bêtifaqiya ji rûçikê min, kete nava wan, min qet nikarîbû alîkariya wan jî bikira. Ez hêvîdar im ko tiştên min heta niha ji te re gotin, wê ji bo te baş bin. Dil dixwest, ko ez hîn baştir bikim, lê ez nema dikarim û dibêjim bi xatirê te. Ji bo te û hevalên te serkeftinê dixwazim...«

134

GARDIYAN  
HESENÊ METÊ  
roman

HAWARA DÎCLEYÊ

1  
www.nefel.com  
info@nefel.com  
NEFEL  
Hawara Dîcleyê  
—|—

1

2

Hawara Dîcleyê

—|—

MEHMED UZUN

NEFEL

Stockholm

2003

www.nefel.com

info@nefel.com

3

Mehmed Uzun: Hawara Dîcleyê – I –

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com

info@nefel.com

© Mehmed Uzun û Nefel

Çapa dîjîtal: 2003

ISBN: 91-89687-13-2

Grafîka pirtûkê: Nefel

Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike

û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Zerya, keça min

Alan, kurê min

Çaxê umrê min di umrê we de bû,

dengbêjên mîna Biro hebûn ko bi dengê xwe

ruhê me terbiye dikirin. Ew êdî neman...

Hûn ê hew bikaribin li kêleka wan rûnin

û li dengê wan guhdarî bikin.  
Bi hêviya ko hûn bikarabin dengê wan  
tê de seh bikin,  
ez Hawara Dîcleyê yadîgarî we dikim...

MEHMED UZUN

5

6

Sonus est, qui vivit in illa...

Dengek, tiştê ko li pey wî/wê maye, aha ev e, dengek...

7

8

êza yekemîn a vê romanê 28-ê adara 1985-an, lî Sûriyê, bajarê

R

biçûk û şêrîn ê Derya Spî Baniyasê hate nivîsîn. Ez li mala  
neviyên Mîr Bedîrxan, Celadet Alî Bedîrxan û xanima wî (her-  
weha dotmama wî) Rûşen Xanimê bûm. C. A. Bedirxan, ji mêj ve,  
1951,

wefat kiribû. Lê li her aliyê malê şopên wî yên jîndar dixuyan. Rûşen  
Xanim ko hingê umrê wê nêzî heyştêyî bû, li malê, bi xatire, bîr û  
siya

Bedirxaniyan dijiya. Ez li wir bûm, – ji ber ko min dil hebû jiyana Mîr  
Bedirxan biqulibanda ser romanê. Ma ji bo vê yekê, ji wê mala  
kevnare

ko di nav pêlên tarîxa do de bû, çêtir cîh hebû?

Belê, rêza yekemîn a vê romanê li wir hate nivîsîn, ji devê Mîr  
Bedirxan, bi nefesa wî. Lê ji navberê wext bihurî, dewr û dewran  
derbas

bûn. Min sê romanên din nivîsîn, – ko ji wan Bîra Qederê bi deng û  
ne-

fesa neviyê Mîr Bedirxan, C.A. Bedirxan hate hûnandin.

Havîna 1994-an, roja 17-ê tebaxê, pismamê min Yilmaz Uzun li dora  
çiyayê Cûdî hate kuştin. Yilmaz, yek ji şervanên bijarte yê tevgera  
kurd

bû. Ew bi qasî yanzdeh salên ko her rojê wan bi lêdan, heqaret, şikence, birçîtî û kirêtiyê tijî bû, li girtîgehên eskerî yên Turkiyê ma, piştî ko ew ji girtîgehan derket, wî xwe spart çiyayên devera Botanê û tevî hevalên xwe, tevî serhildana çekdarî bû. Ê ew li wir, nêzî çemê Dîclê, li serê çiyên hate kuştin.

Dotira rojê, nivê şevê min xebara mirina wî bihîst. Ez ji tecrubeyên xwe dizanim, telefonên ko nivê şevê tîn, ne telefonên xêrê ne. Nivê şevê telefon lêket, dostê ko ji Turkiyê telefon dikir, xebara nexweş bi min gîhand,:

»Yilmaz hatiye kuştin... pêşî ew hatiye girtin û paşê bi şikence bedena wî lîme lîme bûye, guh, bêvil, dest, mil, pî, ling, hemû bedena wî perçe bi perçe jêbûye, heta ko ew hêdî hêdî miriye...«

Wê şevê, heta sibê ez li oda xwe ya xebatê rûniştim û li Yilmaz fikirîm.

Li zaroktî û xortiya wî, li dê û bavê wî ko umrê xwe li ber deriyên zîndanê derbas kirin, li kekê wî ko Yilmaz hê zarok bû, hate kuştin, li herdu birayên wî yên din ko pê re li zîndanê bûn û xwehên wî ko li welatê xerîbiyê bûn, li têkoşîna wî ko hema çî bigire her roja wê bi xwîn, xwîdan, jan û keserê tijî bû, li mala wan a fireh, li rûyê wî yê ronî, bejn û bala wî

ya dirêj, meş û gotinên wî yên qehîm... Li qedera wî ko kê-m-zêde, ji mêt  
ve ye, qedereke giştî ya navçê ye. Li şerê welatê kurdan ko kê-m-zêde, ji sed  
û pêncî salan û vir ve, bixwîn, bi trajediyêke bêpayan dubare dibe û de-  
wam dike.  
Li ber destê sibê, gava çirûskên dawîn ên stêrên şeva ronî jî çûn ava, min  
li ser kaxizekê navek nivisî; Biro.  
Biro, navekî bi du manan e, du kahniyên wî hene. Kahniya yekemîn Hezretî Brahîm e ko bi sebr û hêza xwe ya liberxwedanê nas e. Biro, kur-  
tebiriya vî navê pîroz e. Kahniya duwemîn jî bira ye, yan jî birader. Ew gotina ko min wê şevê nivisî, Biro, hêdî hêdî, bi wextê, qulipî ser dengêkî. Dengêkî ko nivê şevan bi hêdîka dihat û li ber guhê min, mîna  
pejneke sivik a bayekî sivik, bang li min dikir; »li min guhdarî bike, guh  
bide min... li dengê dengbêjan, li dengê Dîclê, li dengê hez û evînê, şer û  
pevçûnê, kîn û nefretê, îxanet û hesûdiyê, hêvî û têkoşînê, afirîn û hunerê  
guhdarî bike...« Bi vî terhî deng jî, bi wextê, bû şexsiyetek. Navê ko min  
nivisîbû, dengê ko bîr û heşê min vedigirt, bû şexis, şexsiyet, huwiyet û  
leheng. Lehengê romana Hawara Dîcleyê... – tevî Mîr Bedirxan û lehengên din. Gotina wê şevê û dengê şevên din bûn rêz. Rêz bûn rûpel,  
rûpel jî defter. Romana ko min dil hebû binivîsanda û gotina wê ya yekemîn li Baniyasê hatibû nivisîn, kete ser riyeke din. Min ew pêncî, şêst

rûpelên ko hatibûn nivîsîn, danîn aliyekî û rê da Biro da ko ew gotina xwe bibêje, rê li ber xwe veke.

Carina şexs, leheng, bûyer an jî pêwendiyên romanekê zora nivîskarê/a

romanê dibin, xwestekên nivîskar diguherînîn û bixwe rê li ber xwe rast

dikin û romana xwe dihûnin. Di romana Hawara Dîcleyê de jî weha bû.

Dengê ko hûn ê di vê romanê de bibihîsin, dengê Biro ye, gotina ko hûn

ê bixwînin, dîsan, gotina wî ye.

Biro kî ye? Dengê Yilmaz ko di nav dewr û dewranan de, mîna bayê hûnikê keleberbangan, digere û do bi îro, îro bi do digihîne? Dengê yek

ji bapîrên Yilmaz ko di nav şerên xwîndar ên eşîran û osmaniyan de jiyaye? (Navê bapîrekî Yilmaz, ji çar bavan, Biro bû, Biroyê Dirêj.)

Dengbêjekî ji dema Mîr Bedirxan ko wê dema tijî xwîn, xwîdan, keser û

jan vedibêje? Dengê ko ketiye dewsa Mîr Bedirxan? Dengê qederekê ko

ji du sed salan û vir ve hertim dubare dibe?

Biryar, ya we ye. Lê belê Hawara Dîcleyê bi dengê Biro ve hatiye pê.

Herçî tiştên ko min lê zêde kirine, ne zêde ne: Hin agahiyên ko dengbêj

û vebêj jê hez nakin, mixabin, pêwîst bûn. Min ew, mîna notan, li dawiyê

10

li dengê Biro zêde kirin. Min şevbuhêrkên Biro yên balkêş, hinekî, ji hevûdu veqetandin, vegotin û serpêhatiyên wî ko carina tevlihev dibûn,

serrast kirin û ji bo her şevbuhêrkekê ko çêla dewr û dewranek dikir û ji

gelek şevan dihate pê, serenavek û hin jimare danîn, – da ko dengê  
Biro

zelaltir û rasterastir bigihe we. Mîna hemû dengbêjan serê Biro jî bi  
navên xerîb, bi tarîxên bûyer û qewimînan ne xweş bû. Lê belê ji bo  
veg-

otineke serast nav, tarîx, cîh pêwist bûn. Ji lewre min secereyeke  
weha,

tevî nexşeyeke Mezopotamyayê, xiste dawiya vegotina Biro. Di  
vegotina

Biro de gelek tişt, nav, cîh, gotin, term, cimle, bûyer, zahf caran, bi  
heye-

can û germahiya gotinê, dubare dibûn. Ê gelek sifate li pey hev rêz  
dibûn.

Min ew hemû, bêyî ko ez vegotin û ûsluba dengê Biro xera bikim,  
gelekî

kêm kirin.

Fermo, rûpelê biqulipînin û li dengê Biro guhdarî bikin...

MEHMED UZUN

11

12

Qendîl

We xwest, ez ê jî bibêjim. Qendîlê pêxin û li dengê jibîrbûyîyan  
guhdaarî

bikin.

Heke gotina min we netirsîne, heke hûn ê heta dawiyê lê guhdarî  
bikin,

hingê, berî her tiştî divê ez bibêjim ko gotina ko hûn ê niha lê  
guhdaarî

bikin, gotina jibîrbûyîyan e. Dengê hûn ê bibihîzin, dengê însanekî  
jibîr-

bûyî ye ko di wextê xwe de dengê însanên jibîrbûyî bû.

Ji bîr mekin; ji-bîr-bû-yî...

Berî ko hûn bipirsîn, ez bibêjim we ka jibîrbûyî kî ne.



Jibîrbûyî, ez im; Biro, Biroyê Dengbêj, yan jî em bibêjin, Biroyê Êzîdî, yan jî Biroyê Kor, yan jî Biroyê Dirêj.

Jibîrbûyî, Ester e; Estera ko min jê re digot, Stêr, an jî Estera file, keldan, nastûrî, yan jî Stêra ezîza ber dilê min, roniya çavê min, Ester, sêwiya

zarşêrîn e zarwinda, bejn û bala lihev...

Jibîrbûyî, Mîr e. Mîrê Cizîra Botan, serekê Ezîzan, an jî Mîrê serhildana kurdî, yan jî Mîrê nefîkirî, yan jî Bavê Têlî, Têliyê kor ko hevalê

min e. Jibîrbûyî, Stephan Manolgiyan e, ko min jê re digot Mam Sefo,

aqilmendê Mîr, alîmê ermen ê xwediyê kitabxana yekta, bavê Migirdîç

ko hevalê min bû û min jê re digot Migo, bavê Armêya bextreş ko – heye

– ez bûm sebaba mirina wê û mîrê Senemxana dîndar ko bi emrê Xwedê

serê xwe danî ser axa rehmetê.

Jibîrbûyî, Apê Xelef e, şivanê yekta yê hemû Cizîra Botan, bilûrvan û

dengbêjê zarotiya min, terbiyedarê ruhê min, bavê Heme ko hevalê min

bû, ko navê xwe kiribû Malmîran û me, min û hevalên din jî Malmîrana

wî kiribû, Malwêran. Ê bavê Gulîzera reben ko li ser riya me ya koça bê-

dawîn winda bû.

Jibîrbûyî, êzîdî ne, ko bav û kalên min in, ko hertim li serê çiya û newalên kûr ên welatê êzidiyan, tên kuştin, hertim ferman û talana wan

radibe, ko ji tirsan nikarin danê sibê û danê êvarê, rûyê xwe ber bi tava ro-

jê bikin û dua û ayetên xwe bideng bixwînin.

Jibîrbûyî, suryan, keldan û nastûrî ne, ko bav û kalên Stêra min a gor-

13

behîşt in, ko nikarin li welatê xwe yê bav û kalan, rehet, azad û serbest li

tîrêjên berbangen ko li milê rojhilatê Dîcle, Zab û Xabûrê hiltê binihêrin,

li esmanên çikî sayî yên şevên Mezoptamyayê temaşe bikin.

Jibîrbûyî, ehlê Cizîra Botan, însanên Hekaran, xelkê Mikus, Wan û Serhedan in ko li dijî hevûdu, li dijî eşîrên cîran, eqelîyetên pismam, li di-

jî dewleta Osman û dewleta Farisan, li dijî hemû dinyayê şer dîkin, hey-

ata wan bi şer dest pê dîke û bi şer kuta dibe û hertim tînan xapandin, qirkirin û koçkîrin.

Jibîrbûyî, mal û malbata Mîr, law û keçên wî, bira û birazî, xal û xwarziyên Bedirxaniyan in ko nîrê Osmaniyan û zîziya welatê xerîbiyê

bûye qedera wan.

Jibîrbûyî, biraziyê Mîr Yezdînşêr e ko şopa umrê me da ser riya welatê

xerîbiye; mîrê Hekaran Nûrîlah Beg û ehlê wî, mîrê Mikusê Xan Mehmûd û ehle wî ne, ko tevî me ketin ber pêla welatê xerîbiyê û li wan

deran ji bîr bûn.

Jibîrbûyî evana û kesên din in ko ez ê ji we re, ji pêketina qendîlan heta

vemirtina wan, carina kite bi kite, carina di ser re, qala hal û hewal, coş û

hêvî, jan û keserên wan bikim.

Hûn ê niha bipirsin ka ev însan çima jibîrbûyî ne. Ez bibêjim we; ev î-

san jibîrbûyî ne, ji ber ko bindest in, biserneketine û têk çûne.  
Bindestî,  
malwêranî ye, zimanê însanê bindest qifilkirî, destê wî zincîrkirî ye,  
ne  
dikare bibêje, ne jî binivîse. Biserneketin, mîna birîna min, birîneke  
xedar e, ko hêdî hêdî birîndar dikuje. Gotina însanê biserneketî,  
hêdî  
hêdî, winda dibe, heyata wî, dewr û dewrana wî dikeve ber pêlên  
wextê û  
dibe hîç û pûç. Ne gotineke însanê biserneketî dimîne, ne jî tarîxeke  
wî.  
Têkçûn, jixwe ji nav diyar e, mirin e. Dengê însanê mirî nayê bihîstin,  
nefesa wî nayê hîskirin.  
Heke hûn bipirsin ka ez kî me, ez ê bibêjim ko ez, yek ji van însanan  
im, însanekî ji însanên bindest, biserneketî û têkçûyî.  
Gotina min, gotina wan; dengê min, dengê wan e.  
Ez, Biroyê dengbêj im, ez ê heyata wan, jan û kesera wan, hêvî û  
xwest-  
eka wan ko di nav dengê wan ê windabûyî de veşartî ye, ji we re,  
bibêjim.  
Umrê min ê ko niha êdî bi gavên lez ber bi qonaxa dawîn dere, eger  
ez  
ne şaş bim, kêm zêde, li dora pênceyî ye. Di vî umrê kin – heye ko  
dirêj  
– ê teres de, min gelek tiştên xweş-nexweş, rind-kirêt dîtin, pêrgî  
gelek  
tiştên ecêb ko min hîç texmîn nedikirin, bûm. Mîna vî çemê Dîcleyê,  
min jî şahidî li best, daxwaz, hêvî, dilşikestin, jan û keserê kir. Mîna  
14  
pelekî tenik ê rihanê ko ketibe ber pêlên Dîcleyê, ji Cizîrê heta  
Stenbolê,  
ji Stenbolê heta Girîtê, ji wir jî heta Şamê ez geriyam, min dît û  
bihîst. Li

Cizîrê, Diyarbekir, Bêrûd, Şam, Heleb, Nînova, Mûsil, Bexda, Stenbol  
û Xaniyayê min ziyaretgeh, meyxane, dersxane, qesr, saray, zîndan,  
girtîgeh, mizgeft, dêr, hevra dîtin, gotinên xerîb, bi zimanên xerîb,  
li  
gotina xwe ya kurdî zêde kirin. Min li dengên bêhejmar guhdarî  
kirin, li  
rûyên bêhejmar nihêrîn, hîs û pejnên bêhejmar nasîn. Ez bûm  
şagirtê  
wext, tevger, însan û bûyeran. Ez bûm xwediyê ders û tecrubeyên  
bêhempa, – ko niha êdî bi kêrê çu tiştî nayên.  
Lê belê tevî van ders û tecrubeyên heyata min a bêkêr, min, du tişt,  
çu  
carê, fahm nekirin; çima bindestiya vê Mezopotamya kambax  
evçend  
kûr, dûr û hûr e? Çima însanên Mezopotamyayê hertim bi derbeyên  
xedar hildiweşin? Çima bindestî weha bêdawîn e?.. Li milê din, ez  
çu carê  
tênegihîştim çima ev deverên kevnare yên miqedes evçend bi kîn û  
ne-  
fretê dagirtî ne? Çima însanên der û dorên Firat û Dîcleyê, tevî ko  
ew  
bindest in, evçend li dijî hev in, evçend gora hev vedidin?  
Bêguman ez dizanim, însanê bindest mîna pizota êgir e, zirara wî,  
berî  
her kesî û her tiştî, jê re ye. Însanekî weha mîna dûpişkê bêkeysketî  
ye, ji  
bêgaviyê, bi der û dora xwe, eger li der û dorê kes nîn be, bi xwe  
vedide,  
derzî û jahra dûpişkê ko ji bo parastinê ye, dibe mirina wî. Ez  
dizanim,  
qurban, bêgav e û însanê bêgav dikare her tiştî bike, dikare, heke  
fersendê

bibîne, ji nişka ve bibe celad. Di nav her milletî de, li her navçeyî  
bêgav,  
bindest, qurban û dûpişkên bêçare hene. Lê we li kû derê dinyayê  
dîtiye  
ko navçeyeke seranser, însanên hemû navçê, têr û birçî, xweş û  
nexweş,  
desthilat û jar, mîr û kizîr, gundî û bajarî, hemû bi hev re, bindest in,  
bûne dûpişkên jahrîn û bêrawest bi hev vedidin? Em bibêjin, li  
dereke  
dinyayê rewş, demeke kurt an dirêj, weha nexweş e. Lê we li kû  
dîtiye ko  
ev rewşa hanê her û her dewam dike, dubare dibe û dewsa ko  
biguhere,  
herkesî diguherîne û dike esîreki pêncperan ê vê qederê?  
Hûn hatine ko li min guhdarî bikin, ez dizanim, lê niha bersîva pirsê  
min bidin; we mûsîbeteke weha li kû dîtiye?..  
Li dora xwe binihêrin, ji her derê xwîn dilop dike. Ax dinale, av diqîre,  
ba dinehwirîne. Çima? Ji min re bibêjin çima ev axa bimbarek ko bi  
ava  
Firat û Dîcleyê dihate avdan, niha, di nav bêdengiya zîz a şînê de, bi  
xwînê tê avdan? Hema çi bigire, di hemû gavên kulek û xeşîm ên  
umrê  
min ê teres de, ez li van herdu pirsan fikirîm; bindestî û kîn û nefreta  
bêhempa ya navçê. Gava ez li Cizîrê, hê li Medresa Sor şagirtêkî  
nezan ê  
15  
zanîn û ilmê bûm, hê hingê, li milekî çavê min li ser rêzên tevîhev  
ên  
rûpelên kitabên zehmet ko li ber min bûn, devê min bi rêzên dijwar  
ên  
jiberbûyî tijî, min pisepis dikir, li milekî din jî heşê min li dereke din,  
li

bersîva kahniya kîn û nefretê bû. Ev kahniya malmîrat li kû bû? Heye ko  
haya we jê hebe, di nav gotinên stranên min de ko min hê di xortaniya  
xwe de li bilindahiyên çiyayê Cûdiyê, di berbangên sibehan û hingûrên  
êvaran de, rûyê min ber bi tava ko hildihat, an jî diçû ava, digotin, hin rêz  
hebûn ko her dubare dibûn, kahnî, tu li kû yî? Kahnî tu li kû yî? Di nav  
wî şer, pevçûn, qetliyam û gola xwînê de ko ji nişka ve bi ser me de hat,  
ko ez ê qalê bikim, min hertim gotinek dibare dikir, çima, çima? Li ser  
riya dirêj û kesertijî ya sirgûnê, li ser pêlên har ên Derya Reş ko em di  
keştiyeke osmaniyan de mîna hêlekanekê, bi gurmegurma pêlan re, geh  
bi vir de, geh bi wir de diçûn, hingî min ji yara xwe ya birîndar dipirsî,  
Stêra min, li stêran binihêre... ma ev stêr bi halê me nizanin, ma çima ew  
nayên aliyê me û birînên me derman nakin? Çima ew bersîva vê zilmê, vê  
nezaniyê, vê kîn û nefretê nadin? Ez li Girîtê, danê êvaran, li ser bircên  
keleha Xaniyayê rûdiniştim, berê min li ava şîn a Derya Spî ko mîna cawekî hevrêşimî bi rengên şîn, kesk û sor leylan dida, destê min li ber  
guhê min ko hertim li ser dangan bû, min dengê strana xwe bi dengê  
pêlên Derya Spî digîhand û jê dipirsî, deryayê, ezbeniyê, çima, çima?

Herçî Şam, ko qonaxa dawîn a koçberiya me bû, ez li oda biçûk û germ  
a Mîr ko bi mehfûr û kulavên rengereng raxistîbû, li kêleka Mîrê min ê  
şikestî û gelekî westiyayî rûdiniştim û gava ko Mîr, di destan de tizbiya  
sedefî ya not û neh libî, dest bi xwendina Qurana kerîm dikir, min jî got-  
inên stranên nû ko hêdî hêdî dikemilîn û li hev dihatin, di ber xwe de,  
dubare dikirin, Mîrê mino... em li kû, kahnî li kû?  
Kahnî; kahniya heyata însan, zayîn; kahniya evîn û evîndariyê, zelaliya  
zaroktiyê, westa kalbûnê, kêf û henekê, best û coşê, şeng û şongê, xebat û  
lebatê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê û mirin û kuştinê... Kahnî, kahniya  
windabûna heyata însan, mirin... Heyata min, ji kahniyekê ber bi kah-  
niyeke din.  
Lê belê kahniya bîndestiyê, kîn û nefretê?.. Ev ji kû dertên? Ji kûrahiyên şevê ko bi perda xwe ya reş dinyayê vedigire û dixê nav xeweke  
xeşîm ê kûr? Ji kûrahiyên vê axa reş a bi bereket ko ji hezaran salan û vir  
ve ye, hemû Mezopotamyayê têr dike? Ji kûrahiyên ba û bahozên qedîm  
ko li gopikên çiyayên Cûdî, Herekol, Bagok û Hekaran, bi fizîn, bi xeşmet, xwe li ba dike? Ji kûrahiyên xewnên şevên reş ên bêpayan bêdeng  
16  
ko hema çi bigire hîç wextekê nayên zimên? Ji kûrahiyên xwîna sor ko di

rehên însanên bêgav de, hertim bi coş, bi kel, bi rik û bi kerb diherike? Ji

kûrahiyên dilê wan ko bi hesret, hêvî, best, êş, xizîn, şerm û bi daxwaza

tolê hildavê?

Li dara dinyayê ji herkesî bêtir diviya me, însanên Mezopotamyayê, ehlê Dîcleyê bizanibûya ka ev kahniya ko mîna kabûsekê, mîna şûrekî li

ser stûyê me hilawestiye, çi ye û li kû ye. Lê ez ji tecrubeyên keft û leftên

heyata xwe ya fetloke dizanim; em bi hîç tiştekî nizanin, ne kahnî, ne za-

yîn, ne heyat û ne jî mirin, bi çu tiştî... Heke me bi tiştekî bizanibûya, ji

tecrube û keft û leftan ders werbigirta, ne halê me dibû ev halê bêhalan,

ne jî mirin dibû nan û ava însanên Dîcleyê. Serê xwe hildin û li derve, li

Dîcleyê binihêrin, guhê xwe bidinê û dengên ko ji Dîcleyê bilind dibin,

seh bikin. Ev, dengên çi ne, dengên kê ne? Ava Dîcleyê çêla çi dike, behsa

kê dike?

Dîcle, ava Dîcleyê, dengê ava Dîcleyê. Ez, dengê min, stranên min, stranên min ên li ser Dîcleyê;

Ro, ronahiya rojê, tîrêjên ronî.

Germahî. Geşî, xweşî.

Bihar, dilşahî.

Dinya dikene, ax dinale, sar, seqem dihele.

Av vedije, Dîcle hişyar dibe.

Bîhn, ax, herî, dar, ber, gul, kulîlk. Dinya vedije.

Av, avzê, kahnî, co û çem.

Ji dahl, daristan, zinar, çiya.



Ji herderî, ji jêr, ji jor, ji çarmedor.  
Av, Dîcle. Dîcle vedije, Dîcle har dibe.  
Ro û Dîcle. Tav û av. Tîrêj û pêl.  
Bi hev re, di nav hev de.  
Dîcle dibiriqe.  
Dîcle diçirise.  
Dîcle distrê.  
Dîcle dibêje.  
Dîcle çi dibêje? Guhê xwe bidin ser dengê Dîcleyê, bi dîqet, bi hizir.  
Bibêjin ka gotina Dîcleyê çi ye?  
Ez, dengbêjê Dîcleyê, ji we re bibêjim; deng, dengê mirî, windabûyî  
û

17

jibirbûyîyan e û ava Dîcleyê strana zîz a wan dibêje.  
Roja ko fermana me rabû û Mîr, çar bermaliyên wî, çardeh cariyên  
wî,  
keç û lawên wî yên hê hingî bêhejmar, bira û biraziyên wî, mal û  
malba-  
ta wî, ehl û eşîra wî, em, dildar û şîrîkên şikestî yên qedera wî, hemû  
bi  
hev re, ketin ser riya welatê xerîbiyê, danê sibê, gava tîrêjên roja  
zêrîn li ser  
ava Dîcleyê diçirûsîn, bi dilekî zîz û kesertijî, min li Dîcleyê nihêrî û  
ez  
weha fikirîm; li vê yeka kambax binihêre, Dîcle heyat, bextiyarî û  
serfi-  
raziyê dibexşîne me û em jî mirin, jan û keserê didin wê.  
Umrê Dîcleyê çiqas e, ji çend hezar salan û vir ve, ev ava boş weha  
bise-  
br, bêwest, bêrawest diherike? Umrê mirinê çiqas e û ji kengî ve ye  
ko  
mirin li der û dorên Dîcleyê, mîna xezeba Mûsa yan jî tofana Nuh,

evçend bi xurtî, li dar e? Xezeba Mûsa ya li ser fîrewnan yan jî tofana  
Nuh  
a li ser neçêyan heta dereke û wextekê bû, piştî wê ew miçiqîn. Lê  
kah-  
niya vê mirina kambax ko gelekî bi xezeba Musa û tofana Nuh  
dişibe, ko  
hertim li dora me ye, çima namiçiqe?  
Berî niha bi demeke kurt, Mîr mir. Heye ko sê, çar hefte, wî, di oda  
xwe  
ya biçûk de, li ber pencera fireh ko pelên çîkî kesk ên dara ziqûmê li  
dorê  
rapêçiyayî bûn, di nav kitab, ayet, hedîs û telqînên xwe de, bi  
hesreta axa  
bav û kalan, kahniya evîn û derdan, serê xwe li Şamê danî ser axa  
rehmetê  
û ji her tiştî xatir xwest û bêveger çû.  
Stêr mir, na ne ko mir, hate kuştin.  
Mam Sefo Manolgiyan, Migo, Armê, diya Migo û Armê Senemxan,  
xizmên wan, hemû, mirin.  
Apê Xelef mir. Heme, Malmîranê malwêran mir. Gulîzera xwediya  
guliyên reş mir.  
Ne yek, ne dudo, bi hezaran nas, dost, heval, ehl û însanên ko min  
di-  
nasîn, mirin.  
Ermen mirin. Suryan, keldan, nastûrî bêhejmar mirin.  
Êzidî mirin. Kurd mirin.  
Ez ê jî bimirim. Ez bi birîna xwe dizanim, ev birîn nacebire, ev ê min  
bikuje.  
Ez dibêjim, ew mirin, lê rastî weha ye, ji Mîrê min ê ko ji derd, kerb  
û  
hesretê mir pê ve, yên din hemû hatin kuştin. Bi ecelê xwe mirin  
tişteki

ye, bi şûr, xencer, kêr, demançe, tiving û topan mirin tişteki din e.  
Li der

û dorên Dîcleyê mirin nîn e, kuştin heye. Ecel nîn e, fermana melekê  
Ezraîl, bi qewlê Êzidiyan Melekê Tawis, ko bi haletên kuştinê tê,  
heye.

Melekê Tawis bi du şêweyan tê nik me, însanên fanî, ko ji afirînê  
bêtir ji

18

hilweşînê, ji evînê zêdetir ji kînê hez dikin; yek, bi lorîna nazik,  
gotina

xweş û xewa şêrîn. Dudo, bi şûr, xencer, demançe û tivingê. Para  
Mezopotamyayê, şêweyê diduyan e.

Ez ê jî bimirin, ji ber ko qesta xencerê, fermana melekê nemir, qesta  
kuştina min bû.

Bêşik ez ê ji we re çêla evîn, xweşî, hêvî, coş û heyecanê jî bikim. Lê  
heke

hûn meraq bikin ka ez çima weha behsa mirin û kuştina bedbîn  
dikim,

bersiva min ev e; mirin û kuştina ko min, di hemû heyata xwe de  
şahidî

lê kiribû, berî niha bi çendekê, piştî mirina Mîr, di nav kirasê yekî  
zikreş

de, mîna segekî har ê devgirêz, ji nişka ve, derket ser riya min û êrîşî  
min

jî kir. Çare nîn bû, min diviya bersîv bida, mîna hespê ko di geremola  
çemê Dîcleyê de, veciniqî û matbûyî, çavên wî li qeraxên çem, li ber  
xwe

dide û dixwaze xwe bi qiraxê bigihîne, welê min jî diviya xwe ji  
geremo-

la xwînê xelas bikira. Çare nîn bû, min segê har di nav xwîna wî de  
gevizand. Da ko ez nemirim, min segê segan kuşt, da ko ewî  
nikaribûya

dest bibira xwe û ez bikuştima.

Belê, min îsanek kuşt. Ez ko ewçend ji kuştinê direviyam, ewçend min ji kuştinê nefret dikir, di dawiya umrê xwe de, bûm mêrkuj û min jî merivek, bi derbên xencerê, xiste erdê. Gerçî îsanê ko min kuşt, segekî har, bênamûsekî rezîl bû û xwîna wî, bi pereyên çikosan jî, bi pênc pereyan nedikir, lê kuştin bi min nediket. Bila Yezdanê mezin ceza wî bi-dayê, bila ew bêbextê bêbextan bi derdekî bêderman biketa ko dermanê wî şîrê teyran û qoçê keran bûya. Mixabin welê nebû, di wextekî min ê gelekî zîz de, ko ne dengê dil, ne jî dengê heş digihîşte min, her tişt bi leza birûskê qewimî. Lê eger wî bênamûsî bi xencera dudevî ya zîvhêlî êrîşî min nekira û ez birîndar nekirima, min ê ew nekuşt.

Xencera ko pêşî di destê wî bêşerefî de bû, rabû, bi qasî kêliyekê li hawayê, bi şewqeke gelekî ronî çirûsî û ber bi zik û navtenga min daket.

Xencêr cil û bergên min çirandin, laş û çermê min qelişandin û agir ber-da bedena min. Mîna ko hûr û pizûrên min derbin, welê nefesa min çikiya, bi qasî bîskekê dinya li ber çavê min reş bû. Lê çi bû, çawan bû, ez nizanim, gava xencer dîsan rabû, min rahiştê. Destekî min li ser devên xencerê, bi destê din, min çend gurmistên rehmanî li ser sûretê wî bêşere-fi teqandin. Tevî ko destê min jêbû û devê xencerê gihîşte hestiyan, min ew berneda. Ê em tewirîn erdê. Demeke gelekî dirêj li erdê me hevûdu

bir û anî. Mirin li odê bû, Melekê Tawis, bi xencera dudevî, li wir, li ser

serê me hilawestî bû. Em ê bimirana, ez, yan jî ew, yan jî em herdu.

Rengê

19

oda xweşraxistî guherî, xwînê rengê xwe da hemû odê, cil û bergên me,

dest, pî, mil, rû û hemû laşê me, mehfûrên li erdê raxistî, dîwarên odê yên

spî, dîwana mişmişî ya koşê, hemû, her tişt di nav xwînê de ma.

Bi dû pevçûneke gelekî dirêj re, ez, bi hêdîka, hemû bedena min bi janeke bêpayan ketî, rabûm ser piyan. Lê ew bêşerefê bêşerefan ranebû.

Xencer di destê min de bû. Bi qasî çendekê ez, bi zehmetî, li ser serê wî

rawestiyam û min lê nihêrî. Çavên wî, beloq, vekirî bûn, rû, simbêl û rîha

wî di nav xwînê de bû, ji bêvila wî xwîn diçû û ji stûyê wî xwîneke boş

dipijiqî.

We hîç li çavên însanên nûmirî nihêriye? Min gelek caran, li gelek de-

veran ev çav dîtine; li qeraxên çemê Dîcleyê ko gelek caran bi rengê xwînê

diherikî, li newalên kûr ên Lalêşê ko ziyaretgeha êzidiyan e, li der û dorên

Kahniya Spî ko kahniyeke miqedes a Laleş û yêzidiyan e, li gundên Nînovayê ko cîh û warên êzidiyan e, li ber lingên keleha spî ya Seîd Begê

ko bi hêlîneke teyrên êlo dişibiya û bi destê paşayên osmaniyan hilweşiya,

li ber û di nav dêrên keldanî û nastûriyan de ko mîna hêlînên teyrên baz

xwe di nav gelî, zinar û çiyayên asê yên Şemdînan, Şîrwan, Dêrezor, Nehrî, Bişems û deverên din ên Cizîra Botan û Hekaran de veşartibûn, li ser kelekên ko di çemê Dîcleyê de, ji hezar salan û vir ve, însan, heywan, rêwî, birîndar û mirî dibirin û dianîn, li hewşa fireh û hertim ronî ya Medresa Sor ko warê îlim, zanîn û merhemetê bû, li kêleka Birca Belek a qesra Mîr ko li ber devê Dîclê lêbûbû, ko hertim tijî jin, cariyê, zarok, aqilmend, kumandar, alîm, şaîr, dengbêj, dîndar, şêx, mîr û axa bû, li zozanên çiyayê Cûdî ko bi bilindahiyên xwe mîna teyrê simîr, nobedarî li hemû navçê dikir, li hawîrdorên gola Êrmiyê ko hêzên çekdar ên Mîr dirêjî kiribûn, li deştên zer ên Cizîra Botan ko qulipîbûn ser qata şer ko di navbera hêzên kurdan û osmaniyan de dihate pê, li doralîyên sûr û bir-cên keleha çiyayê Ewrexê ko me, Mîr û nêzên wî, ji bêgaviyê, xwe spart-ibûyê, li ser rîya bêdawîn a welatê xerîbiyê ko piştî şikestinê derketibû pêşiya me, di nav keştiya kevnare de ko li ser pêlên Derya Reş, mîna pelekî zerbûyî û hilweşiyayî yê payizê, bi hêdîka, hêl dibû, li Stenbolê, paytextê padîşahê osmaniyan Siltan Evdilmecîd, di zîndanên tarî de ko em, girtiyên Cizîra Botan, Hekar û Mikusê, mîna pezên ko bi şebekê ketibin, li ser hev, bêyî ko haya me ji roniya rojê, tariya şevê hebe, rûniştibûn, li Girîtê, warê me yê xerîbiyê, li bajarê kevnare Xaniyayê ko ji

bo min bû medreseyeke nû mîna Medresa Sor û gotina  
serpêhatiyên

Hektor, Parîs, Helena, Aşîl, Odysseus û Penelopê ko gelekî bi gotina  
ser-

20

pêhatiyên me dişibiyên, gîhande min...

Min li hemû van deran, bi çavê xwe, mirî dîtî, çavên wan ên vekirî,  
rûyên wan ên sar, termên wan ên ko hew diliviyên dîtî û bi guhê  
xwe li

çêlên mirî û ketiyên guhdarî kirin. Û dawîya dawîn jî li Şamê, bajarê  
miqedes ê misilmanan, bajarê ko diviya bajarê merhemet û wijdanê  
bûya

û di dawîya umrê me de sikûnetekê bexşî me, însanên nesakîn û  
westiyayî yên şer, pevçûn û xerîbiyê bikira, ji bo min, qulipî ser  
bajarê

mirin û kuştinê. Her cara ko min çaven mirî dîtî, ez li melekê ezîm  
û

abadîn, Melekê Tawis û li şûr, xencer û tivingên wî fikirîm. Çavên  
mirî

ez dilşikestî dikirim; hemû keft û lefta heyatê hîç bû, dawîya ko hîç  
çu î-

sanekî nikaribû jê bireviya, xwe jê xelas bikira, bi tenê ev bû, mirin.

Çavên mirî ez kêfxweş dikirim; mirî ne ez bûm, mirin ji min dûr bû.

Lê

li Şamê, mirina ko hertim li dora min bû, hertim di nav hîsên kûr de  
ne-

fesê li min diçikand, hate û pêşî bû pardarê heyata min, paşê jî  
heyata

min, heyata yara min têkber.

Min kê, çima kuşt? Ez ê, kite bi kite, vê ji we re bibêjim.

Ez ê çêla kuştina Stêrê, yara heyata min, jî, dîsan, kite bi kite, bikim,

hem çawan Stêr çendîn caran ji şûrê mirinê xelas bû, hem jî çawan,

bêyî

ko hay jê hebe, ew kete tora mirinê û bi derbên xedar ên xencerê  
mir. We  
nedît, min dît; ew bedena wê ya nazîk û narîn qulipîbû ser seradeke  
sor a  
qulqulî ko jê xwîn diçû.  
Lê sebir bikin. Gotin ê gotinan veke, bûyer ê bûyeran, derî dê  
deriyan,  
rê dê riyan. Ji bilî gotinê û lihevanîna wê ez bi kêrî çu tiştî nayêm.  
Ne  
pevçûn û şer, ne kar û şixul, ne îlim û siyaset, ne îdare û  
kargerandin, ne  
xulamtî û murîdî, ne jî serekî, mîreki, şêxîtî, axatî. Ez bi tenê, bi karê  
got-  
inê dizanim, û ez ê wê ji we re bibêjim. Lê ne bi lez û bez, bi hêdîka,  
bi se-  
bir, bi germahî, bi sadehî û zelaliya gotina edebî.  
Berî niha bi demeke dirêj, gava ez ketibûm pey reh û rêçên xwe û li  
newalên Lalêşê, li ber deriyên neqîşandî yên tirba şêxê qedîm ê  
yêzidiyan  
Şêx Adî, min li dengê kalên rîhspî û cilspî yên yêzidî ko bi bilûr, def  
û er-  
banê telqîn û stranên yêzidiyan digotin, guhdarî dikir, hin gotin,  
mîna  
lûlûyên zelal ko di telqînên yêzidiyan de behs dibe, ketin ber guhê  
min,  
na ne ber guhê min, ber dilê min; xwedavendê nûranî ji nûra xwe  
heft  
melayike deranî, mîna însanekî bi qendîlekê qendîleke din pêxîne,  
melayike welê afirandî... Bi qendîleke ronî pêxistina qendîleke din,  
bi  
çirûskekê çirûskeke din, yeka din, yeka din... Qendîl, çirûska jînê,  
hêviyê. Jan, keder, hizin, lê tevî vê jî qendîl, ronahiya hêviyê ko rehê  
jîn-



dar ê heyatê ye. Qendîl, ji gotinekê ber bi gotineke din, ji şevbuhêrkekê

ber bi şevbuhêrkeke din... Weha, biûsil, tekûz, bi rêzdarî, aramî. Bi nûr û ronahî.

We qendîl pêxist, ez ê jî bibêjim, quweta gotina xwe bi we bigihînim,

gotin bi gotin, şev bi şev, qendîl bi qendîl.

Lê belê dengê ko hûn ê lê guhdarî bikin, ji bîr mekin, dengê dengbêjekî

1. Dengê dengbêjekî jî, dengê xewnan e, ko tê de do û îro, îro û sibê dib-

in yek; mirî û zindî, çûyî û yê bê bi hev re ne, rastî û qewimî, fikir û xeyal

dikevin nava hev, gelek dengê kesên din jî di nav de ne. Dengê dengbê-

jekî, xuşexuşa Dîcleyê ye ko ji kûrahiyên avê dertê; gumîna çiyayê Herekolê ye ko ji bilindahiyên çiyê hawîrdor vedigire, nalîna pîrejinekê

ye ko hemû însanên xwe winda kiriye, girîna zarokê ye ko li darê dinyayê sêwî û bêkes maye, tepetepa dilê evîndarekê ye ko evîn lê qedexe

bûye, kesera dilê şikestî yê mîrekî ye ko li hember hêzên çekdar ên dewletên mezin şikest xwariye û bîndest ketiye, hawara birîndarekî ye ko

nefesa mirinê ya Melekê Tawis bi ser de hatiye, şerqîna şûrekî ye ko xwîn

jê şîp, şîp, şîp dilop dike, hîrîna hespekî ye ko siwarê wî bi berîkeke tivin-

ga dijmin ketiye, fîzîna bayekî ye ko xwe ji rojhilatê çiyayên Hekaran dirêjî çiyayê Bagokê dike. Di nav dengê dengbêjekî de dengê jibîrbûyî yê

asûr, nastûr û keldanên dêr û qesrên Tiyarê, Tixûbê, Deştan û  
Nînovayê,  
dengê qedexekirî yê yêzidiyên kahnî, ziving û mezeln Lalêşê,  
dengê ma-  
zlûm ê misilmanên medrese û mizgeftên Cizîrê, Hekar, Wan û  
Diyarbakirê heye. Dengbêj, pêşî, seh dike, guh dide dangan, paşê  
wan  
werdigire û diqulipîne ser dengê xwe û dawiyê jî, mîna ko ez niha  
dikim,  
wan mîna dengê ko ji dengên têkel ên wext û dewr, hez û evîn,  
hesret  
û jan, kîn û nefret, tirs û heyecan, coş û hêviyê hatiye pê,  
vediguhezîne in-  
sanan.

Ji lewre divê hûn ji min nepirsin ka dengê min aîdê kê, çi û kengî ye.  
Dengê min, aîdê herkesî, her tiştî û her wextê ye. Lê bervajiyê vê  
yekê jî

heye ku, dengê min, aîdê çu kesî, çu tiştî û çu wextê nîn e.

Ji min mepirsin ka çi rast e, çi ne rast e, çi kengî û çawan qewimiye.  
Dengê min, dengê rastiya ye, lê ne rastiya şûr û xenceran, tiving û  
topan,

axa û began, şêx û seyidan, berdevk û waqanûseran, mîr û paşayan,  
siltan

û padişahan. Rastiya dengê min, rastiya Dîcleyê ye ko tê de hemû  
dewr

û dewran, şexis û însan hene, ko mîna dewr û dewranan, însaniyet  
û in-

sanan, her û her, diherike.

Fermo, ji we re rastiya Dîcleyê;

22

Guhê min li dengê te, ko qîrîn e, hawar e.

Çavê min li pêlên te, ko xuşexuş e, herikîn e.

Ji deverên dûr ber bi deverên dûr e, di nav wext û heyaman de.

Dengê te, ko bi dengê ba, baran û berfê ve yek dibe.  
Endam û bala te, ko bi tîrêjên tavê, çirûskên heyv û stêrê li hev dipêçikine.  
Li dengê te guhdarî dikim, ko kûr e, dûr e, nûr e.  
Her roj, her şev, ji jor ber bi jêr e, li vir e, li wir e...  
Min ji dangan hez kir; li dengên ko dihatin bihîstin, guhdarîkirin û li dengên ko nedihatin bihîstin, meraqkirin. Ez ketim pey dangan, min guhê xwe, dil û ruhê xwe ji dangan re vekir û bûm dengbêj. Li dinyayê  
her tişt xwediye dengê ye. Ne bi tenê însan, teyr, tilûr û heywan, her-  
weha erd û ax, dar û ber, zinar û çiya, av û çem, ba û bahoz, berf û baran,  
tav û heyam jî xwediye dengê ye. Heta dengê bêdengiyê jî heye.  
Gava  
însan hosteyê şixulê dangan be, ev deng, hemû bi hev re, yan jî yek bi yek,  
dikarin werin bihîstin. Lê belê berî her tiştî meraq divê. Meraq, bi dû re  
sebat, bi dû re jî xebat, da ko însan bikaribe dangan seh bike, wan bibi-  
hîse û li wan guhdarî bike.  
Hê gava ez zarok bûm û min li ber rehleyên dersxaneyên Medresa Sor  
ayet û hedîsên kitabên miqedes, bi erebî, rêzên seydayê Cizîrî, Teyran û  
Xanî, bi kurdî, rêzên şairên faris Fîrdewsî, Hafiz, Sadî û Xeyam, bi farisî  
ji ber dikirin, hê hingê min, tevî wan rêzên bedew ên şairan, li dengê wan  
jî meraq dikir; gelo dengê wan çawan bû? Dewsa feqeh û melayên me yê

rûtirş ko çoyê wan ê dirêj hertim li ser serê me bû, eger şaîran bixwe  
rêzên

xwe bixwenda, wan ê çawan, bi çi şêweyî bixwenda? Dengê wan ê  
çawan

derketa? Ew deng ê çawan bigihîsta me? Hê hingê, danê êvaran,  
gava ez

û hevalê min ê file Migo ko Medresa Sor jê re qedexe bû, piştî  
keftûlefa

rojane ya ders û medresan, li mala wan ko li ber perê Dîcleyê bû, li  
kitabx-

ana gelekî fireh a bavê wî Mam Sefo, ko tijî kitab bûn, em li ser  
xalîçeyên

rengîn ên kitabxanê dirêj dibûn û me li rûpelên kitabên mezin ên  
qehîm

cîldkirî ko tijî resim û wêne bûn, dinihêrîn, min dengê wan wêneyên  
în-

sanên bêdeng meraq dikir; eger ew ne wêne, lê însanên zindî bûna,  
ew ê

çawan bipeyiviyana, bi çi zimanî, bi kîjan dangan? Wêneyan çi  
digotin?

Kitabeke gelekî mezin hebû, rûpelên wê zerbûyî, cîldê wê yê darîn  
çermkirî bû. Di her rûpelê kitabê de wêneyekî zelal, reş-spî, hebû.  
Filîsof

û kumandarekî yewnanî ko tevî deh hezar neferan di Anatolî û

23

Mezopotamyayê, di welatê kurdan û ermenan re derbas bûbû, wê  
kitaba

mezin ko çêla wê gerê, yan jî bi qewlê nivîskar veqerê, dikir,  
nivisîbû.

Navê nivîskar gelekî zehmet bû, ji lewre min navekî din lê kiribû,  
Keso.

Min û Migo, rûyê me ber bi pencera vekirî ko li Dîcleyê dinihêrî, di  
nav

gulokên tîrêjên tavê de ko di ser ava Dîcleyê re xwe dirêjî hundirê  
kitabx-  
anê dikirin, me rûpelên kitaba Keso vedikir, li wêne û sûretan  
dinihêrî û  
li gora tevger û hereketên sûretan, dewsa wan, em dipeyvîn. Ez û  
Migo  
dibûn dengê sûretên bêdeng. Min bi zimanê kitabê ko bi tîpên latînî  
hat-  
ibû nivisîn û ji milê çepê dihate xwendin, nizanîbû. Lê Migo ko ji bilî  
er-  
menî, bi hin zimanên din ên welatên rojava mezin dibû, bi zimanê  
kitabê, eger ez ne şaş bim, bi fransîzî bû, dizanîbû. Carina, gava  
wêne û  
sûretan şer û pevçûn salix didan, Migo rêzên li binî wêneyan  
dixwendin  
û ew ji bo min şerh dikirin. Lê bala min ne li ser gotinên Migo bû,  
min li  
dengê bêdeng ê sûretan meraq dikir. Kesên wêneyan çawan  
diqîriyan, bi  
çi texlîd dengên êrîş dibirin ser dijmin? Gava ew bêkeys diketin, wan  
çawan gazî û hawar dikirin? Bi qîrîn û qîjîn, bi tika û lavelav?  
Ji bilî Keso hin nivîskarên din jî di kitabxana germ û şêrîn de ko jê  
bîh-  
na taybetî ya kitaban difûriya, hebûn. Navê hemûyan niha nayê bîra  
min, lê gava gotin gotinê veke, bi alîkariya qendîlê, ronahiya gotinê  
bireşe  
ser bîr û heşê nankor ko hosteyê jibîrkirinê ye, hingê heye ko navê  
hemûyan bête bîra min. Lê diduyên din hebûn; Maro û Naso ko  
herdu  
jî Romayî bûn û di wextê Keysar Augustos de jiyabûn. Kitabên wan jî  
gelekî girs, bi textekî tenik cîldkirî, rûpelên wan neqîşandî û nava  
rûpelan

tijî wêne û sûret bûn. Herçî ev herdu kitab bûn, Migo jî bi zimanê wan ê latînî nizanîbû. Lê me li sûretên ko gelekî zelal û lihevhatî bûn, dinihêrîn.

Di şevên bê de ez ê çêla kitaban û sûretên wan bikim, lê bi xêra sûretan û şerhên peregende yê Mam Sefo ko carina dihate kitabxanê, bi ken li me û kitaba li ber me dinihêrî, simbêlên xwe yê boq badidan û ji me re, bi çend gotinan, behsa sûretan dikir, em hînî serencamên kitaban jî bûn. Çi serencamên balkêş, tijî xwîn, xwîdan, girî, jan, keser, heyecan, evîn û hêvî ko çiqasî bi heyata me ya neçar û bi serpêhatiyên me yê keserkûr dişibiyên! Min dengê wan hemû hîs û pêjnan ko di nav rûpelan de bêruh razayî bûn, dibihîstin, ew hemû hîs û pêjn vedijiyên û xwe bi ruhê min ê qeşmer ko ji ber zaroktiyê, hê bîr bi çerxa dinyayê nedibir, digîhandin. Lê piştî ko min jî, bi vî çavê xwe, şer û pevçûn, xwîn û xwîdan û ew hemû hîs û pêjnên rûpelan di heyata xwe ya kambax de dîtin, di dil û ruhê xwe de hîs kirin, hingê ez têgihîştim ko Maro û Naso ne bi tenê dengbêjên

24

welatê Romayê, herweha ew dengbêjên min bûn jî. Kitaba Maro ko bi dengê hizîn ê şikest û bindestiyê ve hatibû hûnandin, çêla bajarê Truwayê, hespê qerase yê îxanetê, şewata bajêr û reva Enasê ber bi welatê

xerîbiyê fikir. Ma heyata me jî nebû mîna serencema kitaba Maro?  
Ma  
hespê qerase yê Trûwayê, çaxa hêzên çekdar ên Mîr ji bajarê Cizîrê  
bi dûr  
ketibûn û di germa havîna zelal de ko xwîdan, bêrawest, ji me û ji  
hespên  
me diçû, li ber qeraxên gola Urmîyê ko tavê li ser avê bi rengên têkel  
ley-  
lan dida, haziriya şerên mezin dikirin, hingê, bi navê Yezdînşêr û  
hêzên  
osmaniyan, bajarê me yê qedîm Cizîrê venegirt? Ma me şikest  
nexwar û  
serê xwe li ber paşa û siltanên osmaniyan netewand, stûyê xwe  
xwar  
nekir, riya me, bi dengê strana hizîn a veqetînê, ber bi welatê  
xerîbiyê  
neçû û em li welatê xerîbiyê bi hîsa hesretê nekizirîn?  
Herçî Safo bû, wî jî di kitaba xwe de ko li welatekî gelekî xerîb û  
nenas  
ê Derya Reş, bi keserê hatibû nivisîn, çêla xerîbiyê fikir. Ma xerîb kî  
bû?  
Ne em bûn? Ma xerîbiya malkambax nebû qedera me, pêlên hov  
ên  
Derya Reş ko bi rastî jî bi rengekî girtî yê xoftijî diçelqiya, tirseke  
bêpayan  
nexist dilê me jî? Ma bayên seqem ên welatên nenas rûyê me jî  
nebirî?..  
Deng li çeperên wext û dewran, tixûbên însan û welatan guhdarî  
nake,  
ew hertim xwe bi dangan digihîne. Deng rê li dengên din vedike.  
Mîna  
qendîlê, bi dengêkî dengêkî din dertê, bilind dibe. Lê însan divê  
dangan

bibihîse, dilê xwe ji dengan re veke, heşê xwe bi dengan bineqîşîne  
û ji

dengan dengekî nû biafirîne da ko bikaribe bibe dengê jibîrbûyî û  
nebi-

hîstiyân...

Dengê nebihîstiyân – an jibîrbûyîyan – dengê birîndaran, dengê  
Armêya çavreş, dengê Gulîzera zirav, dengê şîrîka qedera min Stêrê.  
Estera porzer, Stêra çavşîn, gotinên wê yên birîndar ko mîna kuliye  
berfa çiyayê Cûdiyê, yek bi yek ji zimanê wê yê lal derdiketin. Û  
dengê

nebihîstî yê bav û kalên min ko min tu carê nedîtin û nenasîn.

We ez ji Şamê hilgirtim û anîm bajarê umrê min Cizîrê. We û  
xêrxwazên mîna we ko bi hesreta min a ava Dîcleyê û axa siûda min,  
warê

bav û kalan dizanîbû, çêyîyeke mezin bi min kir. Piştî umrekî gerok  
ko bi

xaçeriyên fetloke tijî ye, ez dîsan vegeyame warê ko ez jê  
derhatim. Riya

navbera Şam û Cizîrê dirêj bû, zehmetî zahf bûn. Lê bawer bikin, li  
rê, ne

êş û jana birînen min ên kûr xema min bû, ne jî zehmetiyên  
bêhejmar ên

rêwîtiya dirêj. Her tişt niha li pey ma, ez li vir im, ez ê li vir, li ser axa  
bav

û kalan nefesa xwe ya dawîn bidim û xwe berdim hembêza Melekê  
Tawis. Ez ê li pêlên ava Dîcleyê, li ronahiya tavê, li şewqa heyvê, li  
çirûsî-

25

na stêrê binihêrim û bimirim, bi lorîna dengê ava Dîcleyê, bi strana  
bayê

hûnik ê berbangên Mezopotamyayê. Wesiyeta min li we, gava  
dengê



min hate birîn, ne bi tenê dengê ava Dîcleyê, divê dengê dengbêjên nûgi-

hîştî jî bistrê, dengê pîrejinan binehwirîne, dengê kalemêran bibêje.

Hûn

divê min bi dangan bi rê kin. Ez ê herim. Lê xwezî min bizanibûya ka bav

û kalên min li kû veşartî ne, da ko we bedena min a sar li nik wan veşar-

1. Lê ne ez, ne jî hûn pê dizanin. Ji lewre hûn divê min li bilindahiyeye

qeraxên Dîcleyê veşêrin, an jî li kêleka tirba Nebî Nuh ko bi keştiya xwe

li bilindahiyên vê axa Mezopotamyayê venişt û konê xwe li van warên

kevnare yên însaniyetê vegirt û ev ax kir welatê me, welatê bav û kalên

1. Yan jî min li ber lingên Birca Belek ko ji sedan salan û vir ve, tîmsala

abadîn a mîr û dotmîran, evîn û evîndaran, deng û dengbêjan, şîir û şaîran e, veşêrin. Hûn bi qîma xwe ne, lê şertekî min her heye; dengê ava

Dîcleyê divê ji min û gora min bi dûr nebe. Yan jî hûn dikarin weha bikin, bedena min bi mehfûreke neqîşandî ya Botanê bipêçin, wê deynin

ser kelekekê û pê qehîm girêbidin, dawiyê jî kelekê berdî nav ava Dîcleyê da ko Dîcle min bi xwe re bibe welatên xerîb û warên nenas.

Ma

însan û umrê însên ne mîna dilopeke ava Dîcleyê ye ko di boşahiya avê

de winda dibe?

Ez nizanim ka kê ev nav li min kiriye, lê navê min Biro ye, Biroyê dengbêj, Biroyê dirêj an jî bi qewlê hesûd û xêrnexwazên min ko mîna

siya min her li pey min bûn, ji deng û eserên dengê min dihesidiyan  
û  
bûn sebaba kuştina Stêrê, Biroyê kor. Bila kêfa hesûd, çavnebar û  
dijmi-  
nan were, Biro, yanî ez ê herim, lê heke ez bikaribim xewn û xeyalên  
ser-  
pêhatiyên xwe di van şevbuhêrkên me de ko bi agirê qendîlê ronî  
dibin û  
bi dengê Dîcleyê olan didin, bibêjim û bibim serî, hingê, tevî her  
tiştî,  
min hêvî heye ko dengê Biro, – herweha dengê jibîrbûyîyan – li pey  
min  
bimîne.  
Herçî korahiya min e, ji şopa kûr a derba şûrê tûj ko ji enî heta çengê  
ye, diyar e. Li vê qedera min a teres binihêrin, min çavê xwe yê rastê  
bi  
derba mirinê vekir û niha jî ew ê bi derba mirinê were girtin. Berî  
niha bi  
umrekî, gava min çavê xwe vekir, bi tenê çavekî min ronahiya dinyê  
dît.  
Ronahiya çavê min ê çepê bi derba şûrekî mirinê vemirîbû. Umrê  
min ê  
beriya derba şûr ko ne zêdeyî çend salan bû û bêguman bi bav, dê,  
heye  
ko bira, xweh, nas, xisim bû, hema çî bigire nayê bîra min. Ew çend  
salên  
umrê min ê beriya şûr di bin siya tarî ya nenasiyê de ye. Tevî ko ez  
cari-  
nan xewn û kabûsan dibînim, çu kes bi zelaî nayê bîra min, çu deng  
kite  
26  
bi kite xwe bi min nagihîne. Di umrê min ê piştî derba şûr de ko  
destpê-

ka heyateke nû bû, yan jî ez weha bibêjim, ji mirinê ve ger bû, ne  
bav û  
dê, ne jî bira û xweh hebû. Bi tenê Biro hebû, zarokê birîndar,  
bêkes,  
sêwî, rûyê wî bi derbeya şûr qelişî û çavekî wî kor. Ê xerîb. Ê  
dilşikestî.  
Ê tirsîyayî...  
Min gote we ko dengê bêdengiyê jî heye. Niha ez ê dengê xwe  
bibirim  
û ez ê li dengê bedengiyê guhdarî bikim. Belê, deng, dengê  
bêdengiyê;  
Deng. Hîrîn. Hesp.  
Tekbîr, Allah, Allah, Allah.  
Deng, teqîn. Qîrîn. Qîjîn.  
Agir, gulok, şewat.  
Deng, şîrqîn.  
Şûr. Şewq, xwîn.  
Dilop bi dilop.  
Şûr, dudevî.  
Şûr, çirûsîn...  
Ê tirs, ji dengê hîrîn, tekbîr, teqîn û şîrqînê tirsîyayî...  
Hemû însan, qeder, bûyer, pêwendî û serpêhatiyên ko ez ê ji we re  
behs  
bikim, min bi çavekî, bi ronahiya çavê rastê dît û bi çavê xwe yê kor  
ê çepê  
jî hîs kir. Şûrê ko şekil û şemalê rûyê min guherand, dinya min jî kir  
du  
perçe; perçeyê ronî ko didît û perçeyê tarî ko hîs dikir. Çavê min ê  
rastê  
ko mîna dûrbînekê, bergehên însan, war û meknan li ber min  
radixistin,  
ne bi tenê alîkariya min dikir, herweha wî alîkariya hevalê min Têlî  
jî ko

ji herdu çavan bû, dikir. Ez û Têlî, em du kesên girs û dirêj, bi çavekî,  
diketin pey seyd û nêçîran, di geliyên bêbinî yên bakûrê Girîtê de,  
em  
diketin pey bizinên kovî ko ehlê Girîtê jê re digotin krî krî.. Herçî  
çavê  
min ê çepê ye, ew dûrbîna bûyerên ko mîna pêlên xezebê yên Derya  
Spî  
ko bi ser me de dihatin, bû. Ez bi çavê xwe yê kor bi hatina bûyerên  
ko li  
rê bûn, dihesiyam. Gava bûyerek ê biqewimiya, şopa şûr, birîna kûr  
jan  
dikir.. Heyata min a şerpeze û peregende ko ji ronahî û tarîtiyê hate  
pê,  
mîna kelekeke Dîcleyê ko ketibe ber lehiyeke har, di navbera dîtin  
û  
hîskirinê de çû û hat. Ji lewre gotina min a ko bi ronahî û tarîtiyê  
hatiye  
hûnandin, esereke herdu çavan, ê ronî û yê tarî ye, bi gotineke din,  
es-  
ereke dîtin û hîsan, mêjî û dil e.  
Ez êdî westiyam. Îşev hewqas. Gotina min a îşev heta vê derê, êşa  
birînê  
27  
nefesê li min diçikîne, dengê min dibire. Niha birînên dest û laşê  
min  
derman bikin, taseke av û misteke mewîj deynin ber serê min, lehîfê  
bikêşin ser min, qendîlê bitefînin û herin. Lê beriya wê, ji kerema  
xwe, wî  
kevîrê boz ê kehrîbar ko sûretê teyrê tawis lê kolandî û neqîşandî  
ye, ji  
dîwarê ber pencerê deynin û bînin bi stûyê min kin. Feqîrekî rîhspî  
yê

yêzîdî ew, di feqîrxana xwe de ko li ber Kahniya Spî, li Lalêşê bû,  
mîna  
yadîgareke oxirê da min. Min jî ew da Stêrê da ko teyrê tawis bibe  
oxira  
evîna min û Stêrê. Oxir... Ez ê gotinê bînim ser oxirê, lê ne niha. Cara  
dawîn min kevirê teyrê tawis ko tîmsala Melekê Tawis e, li nik  
mêrkujek,  
mêrkujê ko bedena nazik a Stêrê kiribû mîna seradê, dît. Bi xêra vî  
kevirê  
hanê ko ehlê Girîtê jê re dibêjin madalyon, min fahm kir ka mêrkujê  
Stêrê kî bû. Niha wî kevirê min ê pîroz bidin min, da ko teyrê tawis  
li ser  
sînga min be û nefesa Stêra min ko ji asimanên min xuricî li nik min  
be.  
Heye ko Melekê Tawis jî îşev, bi dengê Dîcleyê û ronahiya stêran,  
were û  
min, bi baskên xwe, hilde û bibe warê heyv û stêran, warê Stêrê.  
Hingê  
ez ê tevî teyrê tawis, bikevim ser riya dawîn ko Melekê Tawis ê  
nîşanî min  
bide. Ka ew roja hanê!  
De herin, lê ji bîr mekin, berî ko hûn derin, qendîlê bitefînin.

28

ŞEVBUEHÊRK YEK

asiman

Dengê min yanî dengê Biro ko hûn ê îşev bibihîzin, dengê însanekî  
jibîr-

bûyî ye ko di wextê xwe de dengê însanên jibîrbûyî bû.

We xwest, ez ê jî bibêjim. Birînên min îro jî derman bûne, min

mewîjên xwe xwarine, ava xwe vexwariye. Tasa mewîjê û tasa avê  
li kêle-

ka min, kevirê min ê spî yê teyrê tawis li stûyê min, tizbiya belek a  
not û

neh libî ya kehrîbarê di destê min de ye. Çavekî min girtî, yek vekirî,  
dilê  
min bi liyan, merama min niha êdî kelam e. De hûn jî, xortên delal,  
xwediyên dengê zelal, rûnin, cîh û balîfan li ber xwe û piştî xwe rast  
bikin, dengê xwe bibirin, guhê xwe vekin. Êvara welatê keserkûran  
dadikeve, tariya êvara bêgavan hawîrdor radipêçe. Wext, wexta  
gotinê ye,  
de qendîlê pêxin û li dengê jibîrbûyîyan guhdarî bikin.  
Ji derve deng tîn, dengên têkel ên hingûra helesor a  
Mezopotamyaya  
qedîm; gujeguja ava çemê Dîcleyê ko hertim bedew, nazenîn û  
ciwan e,  
qebeqeba kewên ko xêrhatinî li êvara nû û şevbuhêrka me ya nû  
dikin,  
qurequra beqên ko tevî dengê ava Dîcleyê strana êvarê dibêjin,  
şihîna  
hespên ko li hêviya siwarên xwe yên şevê ne, borîna mih û beranên  
ko bi  
dengê şivanan derin mexelên xwe, gumîna def û daholên ko dengê  
dîlanê  
bi bajarê Cizîrê digihînin û himehima bayê şerqî yê sivik ko dengên  
êvara  
Dîcleyê li hawîrdor belav dike.  
Ji hundir jî deng tîn, dengên westiyayî û birîndar ên welatê Dîcleya  
abadîn; tepetepa dile min ê bêterbiye ko hertim zarok e, hertim  
mîna  
zarokekî xeşîm li pey dangan e û çu carê terbiye nabe, çîqeçîqa  
kevîrê  
hesteyê ko fitîla qendîlê pêdixe û rê li şewqa qendîlê û kelamê  
vedike,  
reperepa lingan ko haziriya şevbuhêrkê dikin, pisepisa dengên ko li  
dengên do meraq dikin û dengê pîrejina ko li doralîyê me cîhekî,  
straneke zîz dinihwirîne û dengê xizîn ê stranê bi me digihîne...

Dengên derve, dengên hundir, dengên doralî, hemû bi hev re,  
tişteki ji  
min re, ji Biroyê dengbêj re dibêjin; xwe bi dengên dewr û  
dewranên bi-  
hurî bigihîne, wan dangan ji wir derbîne, wan vejîne, dengên vê  
êvara

29

aram bi wan dangan bixemilîne.

Dengên vê êvara ko li pey rojê westiyayî, nû, hawîrdor vedigire,  
min

hildigire û dibe nik dengên do; ez li wan, li qeder û heyatên tevlihev  
ko

hew kesek li wan difikire, difikirim. Ez, yek ji xwediyê wan dangan  
bûm,

ez bi wan re bûm. Ew çûn, ez mam, lê ew hemû, tevî heyat, qeder  
û

tecrubeyên xwe, îro, qulipîne ser dengê min, bûne merivek, bûne  
deng-

bêj Biro, yanî ez, yanî însanê bêkêr ko ji bilî dangan ji tişteki re nabe,  
ko

di wextê xwe de ne dikaribû ew xelas bikirana, ne jî bi wan re  
biçûya.

Ewana, însanên serpêhatiyên ecêb ko bi xwe jî, bi qeder û  
serpêhatiyên

xwe mat û şaş diman; ewana, derdê dilê min ê kambax, maneya  
heyata

min a bêrûmet... ew însanên bêgav ên ji hizûr û bextiyariyê dûr,  
bêdeng,

bêzar û bêziman, ketî, birîndar, şikestî, nefîbûyî, şewitî, kuştî û  
jibîrbûyî.

Bêgor, bêşîn, bêgoristan. Ji axa xwe, ji welatê xwe dûr. Ji çemê  
Dîcleyê,

ava wê ya pak dûr. Dengên vê êvara sakîn û zelal ko nû hiltê û ji umrê  
min rojêke din jî dibe, mîna pêtên sor ên êgir li ser dilê min, li ser eniya  
min, li ber çavê min ê ko dibîne, diçirûsin û bi qîreqîr ji min re dibêjin;  
dengbêj deng bide, olan bide, bibe dengê wan.  
Êvar tê, mîna her êvarê ev êvar jî bi fen û lîstikên xwe, bi qayide û xwest-  
ekên xwe tê. Êvar ji min dixwaze ko ez, Biroyê dengbêj, hişyar û serwext  
bim û dîsan herim nik wan, bibim deng û nefesa wan, bikevim nav dewr  
û dewranên wan û di nav dewr û dewranên wan de ko bi tamamî dewr û  
dewranên min bûn jî, li gotinan, dangan, pejnan, tevgeran, stran û ser-  
pêhatiyên bigerim, bikevim pey şopên hîsên însanî, pey xwestek û hêviyê, keser û xiznê, – da ko dewr û dewranên bihurî, serpêhatiyên min  
û wan, hemû bi hev re, îro, wextên bihurî bi bîr bînin, wan vejînin û bîr,  
hîs û zanîneke nû bireşînin ser wexta me ko îro yekcar bi darê zora paşayên osmaniyan dîlketî ye.  
Fen û lîstik, qayide û xwestek, mixabin, ne bi tenê ji bo êvaran, lê li her  
derî, ji bo her tiştî hene. Ji bo heyatê, xwarin û vexwarinê, hezkirin û  
evînê, şer û pevçûnê, şev û gotinê, dengbêj û guhdaran, min û we.  
Ji bo do, îro û sibê. Herçî qayideyên vegotinê ne ko ez ji tecrubeyên xwe dizan-



im, bi kurtî ev in; gotin divê vegerin wan dewr û dewranên ko  
vegotin tê

de dizê, bikevin nav kêrahîyên wan dewr û dewranan û li wan  
kêrahîyan

cîhaneke nû bînin pê ko hem nêzîkî rastiyê ye hem jî jê dûr e. Gotin  
di-

vê nerm, germ û pak bin, ne gulover û tirtire, ne jî nizm û durû bin.  
Ne

bi tenê gotinên xweş û bedew bin, ne jî bi fort û payebilindî  
pozibilind û

jixwerazî bin. Gotin divê tesîreke welê bînin pê ko qedera însanên  
ko ve-

30

gotin qalê dike, biqulibe ser qedera dengbêj û qedera wan însanan  
û herçî

qedera dengbêj e, ew jî bikaribe biqulibe ser qedera guhdaran. Yanî  
qayideyê ko ez ê carina lê vegerim, ev e; dengbêj, guhdar û însanên  
ko

lehengên vegotinê ne, hemû bi hev re, bibin yek û bi hev re  
qedereke nû

bînin pê. Qedereke nû ko bikaribe rê nîşanî we xortên delal, nifşên  
nûhatî bike, ko hûn bikaribin tê de hem kêfxweşî û mesûdiya  
însanan

bibînin, hem jî derd û kulên wan.

Heke we dil bi vê yekê heye, hingê bidin pey gotina min ko dê bide  
pey

dewrên bihurî.

Heke we dil bi qayideyê dengbêj û guhdaran heye, hingê ne bi tenê  
guhê xwe, dil û mêjiyê xwe jî bidin ser gotina Biroyê dengbêj ko êdî  
ne bi

tenê Biroyê dengbêj e, herweha dengê mîrekî xort ê hêvîdar,  
şivanekî

kalemêr ê zarşêrîn, evîndarekî çeleng ê ziravbihîstiyar, evîndareke  
dilsoj a  
siûdxirab, stêreke ciwan a birîndar, alîmekî simbêlqeytan ê bextreş,  
dest-  
birayekî qelew ê dilsoz, dîndarekî diranşikestî yê zikreş,  
rastîxwazekî  
rûtirş ê kîndar, berdevkekî rîhspî yê durû, mîrzayekî bejndirêj û  
pozber-  
an ê têkçûyî ye...  
Biroyê dengbêj êdî ev hemû ne; şagirtekî jîr ê ders û terbiyan, guh-  
darekî baş ê gotin û stranan, evîndarekî nexirab ê hîs û pêjnan,  
şervanekî  
nebaş ê şer û pevçûnan, dilsozekî derewîn ê mîr, şêx, axa û began,  
pere-  
gendeyekî serserî yê bajar û welatan û di ser van hemûyan re,  
dawiya  
dawî, têkçûyiyekî pêncperan ê bêmal, bêwar, bêwelat, bêsewda.  
Ji rûniştin, nihêrîn û nefesa we ya kûr diyar e ko hûn dixwazin, ez  
got-  
inê bînim ser bûyer û serpêhatiyên. Sebir bikin. Herçend gotina  
bedew û  
vegotina lihevhatî sebir divê, ewçend guhdarîkirineke biûsil û  
rêzdar jî se-  
bir divê. Gotinên ko niha bi guhê we dikevin, gotinên dengbêjekî kal  
in.  
Dengbêjekî kal ko êdî gihîştîye rojên xwe yê dawîn û êdî têgihîştîye  
ko  
hemû heyat, bi tenê şikesteke xedar e. Ê gotinên wî, ko li welatê  
şerqî, li  
qiraxên Dîcleyê kemilîne, li newalên kûr û li gopikên çiyên bi tava  
berbanga ronî ya welatê şerqî ronahî dîtine. Ê ji kêfxweşiya van  
gotinên  
kevnare re, ko xwediyên wan hemû, ji bilî min, mirine, îro, vê êvara

nûzayî ya zelal û sakîn, payan nîn e, ji ber ko ew dibin gotinên we,  
deng-

bêj û hunermendên rojên bê, sermayedarên vejîn û rizgariya  
gotinan.

Heke ez gotinê weha geh li vir geh li wir digerînim, ev ne bê sebeb  
e. Ev

gotinên ko niha ji lêvên min derdikevin, hemû, ji bo haziriya çûyinê  
ne,

çûyina dewr û dewranên bihurî, peyketina deng û gotinên jibîrbûyî.  
Ez ê

niha bidim pey dengê Apê Xelef û gotinên wî yên dewr û dewranên  
bi-

31

hurî û herim wê roja pîroz ko Mîr bû mîr.

De hûn jî bidin pey min.

Dengê Apê Xelef li gora wext û heyaman, li gora pêwendî û  
tevgerên wî

diguherî. Di berbanga sibê de ko dinya nû hişyar dibû, dengê wî bi  
rengê bû, di danê êvarê de, ko roj diçû ava, yan jî di nivê şevê de  
ko

dinyaya westiyayî dikete xewê, bi rengê din. Apê Xelef ko  
xêrxwazên wî

jê re digotin »Xelefê şivan« yan jî »Xelefê zimanşêrîn« û  
xêrnexwazên wî

jî jê re digotin »Xelefê ehmeq« yan jî »Xelefê doxînsist«, bi herkesî  
re, mî-

na wan dipeyvî. Bi zarokan re mîna zarokê, bi kalemêrekî re mîna  
kalemêrekî, bi begekî re mîna begekî û bi şivanekî re mîna şivanekî.

Heta

ez dikarim bibêjim, bi berxekê re mîna berxekê, bi beranekî re jî  
mîna be-

ranekî. Apê Xelef ko bi eslê xwe pêşî êzidî, paşê misilman û şixulê  
wî jî şî-

vanî bû, bi celebên dengê xwe û bi bilûra xwe ya şeş helqeyî ko jê celebên  
bêhejmar ên dengan derdihat, dikete her qalibî. Ew hem hosteyê  
dengan  
bû, hem jî hosteyê lêxistina bilûrê. Mîna dengê wî, bilûra wî jî di  
xizmeta,  
pêşî însanan û paşê jî heywanan de bû. Bi qasî însanan, heywan,  
nemaze  
pez jî hevalên heyata wî ya neçar bûn. Wî ji zimanê wan, wan jî ji  
dengê  
wî û nefesa bilûra wî fahm dikirin. Pezên ko hema çî bigire hemû bi  
destê  
Apê Xelef dihatin dinyê û pê li erdê dikirin û li ber destê wî mezin  
dibûn,  
bi dengê wî, bi ûsil û dûzan, diçûn çêrê, ser avê, zozanan, mexelên  
xwe,  
bêriyê û hevşiyên xwe yên hingorî.  
Em, zarokên Apê Xelef, ez Biroyê sêwî ko li ber destê wî mezin  
dibûm,  
Heme ko di umrê min de bû û kurê Apê Xelef bû, Gulîzer ko ji min û  
Heme bi qasî du salan mezintir û sê tiliyan dirêjtir, lê ne gulî zer, gulî  
reş  
û keça Apê Xelef bû, geh bi dengê Apê Xelef geh bi dengê bilûra wî,  
em  
ji xewan hişyar dibûn, me dixwar vedixwar, tevgera xwe girêdida û  
derengê êvaran em diketin nav xewan.  
Herwekî wê roja ko kurdan bi dû re mîna »roja pîroz« bi nav kirin û  
di  
heyata min, ya Mîr, ya ehlê Cizîra Botan û ya kurdan de bû  
qonaxeke nû.  
Wê rojê, berî ko stêrên şeva Dîcleyê bi tamamî herin ava û tîrêjên  
roja

nû ya welatê Cizîra Botanê li pey çiyayê Cûdiya serî li esmanan  
hilwerin,  
ez bi dengê Apê Xelef hişyar bûm. Apê Xelef ko kesî nizanîbû ka  
kengî  
dikete xew û kengî ji xewan hişyar dibû, dest bi heyata roja nû  
kiribû. Ew  
bi gavên sivik, di navbera mezelên malê ko ji sê jûrên biçûk hatibû  
pê û  
axura dirêj û tarî ya kêleka malê ko tê de hertim mîh û kavirne nesax  
ko  
nikaribûn bidana pey dengê bilûra Apê Xelef û biçûna çêre û berx,  
32  
berdîr, kahr û gîskin hebûn, diçû û dihat û strana bajarê Cizîrê bi  
hêdîka  
dinihwirand;  
Çûme Cizîrê, Cizîra Botan  
Şalûl û bilbil hev bûne cotan  
Wele wê rindê dilê min sotan  
Wele wê kewê dilê min sotan  
Gotina evinê hevre digotan  
Xizim winda bûn, lê, lê, lê  
Ez derime cem mîrê Botan  
Min bi çavê xwe yê rastê ko dibîne, nedîtibû, lê li gora xêrxwaz û  
xêrnexwazên Apê Xelef, »rindê û kewên« ko dilê Apê Xelef  
sotandibûn û  
wî umrê xwe pê re kiribû cot, li welatê kurdan, zahf bûn. Hinan  
digotin  
ko Apê Xelef bi kêmanî çar caran zewicîbû û li welatê Amediyê,  
Hekaran,  
Amedê û Mukisê, bi qasi keriyê pezên ko Apê Xelef şivanî lê dikir,  
nebûya jî, ne kêmanî keriyekî, zarokên wî hebûn. Ne bi tenê pez,  
nemaze

pezê mêşîn, qerqaş, riser û hemdanî ko guhê wan pel e, guh didan  
dengê  
nermik ê Apê Xelef û dengê bilind ê bilûra wî, herweha keçên  
bedew ên  
bêrîvanan, nemaze yê gerdengaz û lîstikbaz ko heyrana dengên  
bedew  
bûn, guh didanê. Hûn bi ûsila bêriyê dizanin, danê êvarê, gava pez  
ji çêrê  
dihat, berî ko mîh û berxan xwe bigihanda hevûdu, di cîhê bêriyê  
de,  
keçên xama yê bêrîvanan, di destên wan de sîtil û elb, bi qesta  
guhanên  
mîhan ên tijî şîr, xwe digihandin mîhan. Li gora gotinan, wexta ko  
Apê  
Xelef di nav wextên rojê de herî zêde jê hez dikir, wexta bêriyê ko  
di danê  
êvaran de dinya diqulipand ser dîlanê, bû. Hingê dengê wî xweştir,  
bilûra  
wî geştir, kela wî germtir bû.  
Gotin û pistepistan weha digot; piştî ko Apê Xelef bi dengê xwe yê  
ner-  
mik pezên ko bi hesreta berxan sotî bûn, aş û dilê bêrîvanên çav li  
henek  
û lîstikê nerm dikir, hingê, gava wî keys didît, di cîhekî xewle de, bi  
qes-  
ta alîkariyê, li nik bêrîvana herî lîstikxwaz çog datanî erdê û dest  
davêt  
guhanên bêrîvana ko bi guhanên mîhekê mijûl bû. Heke bêrîvana  
ko şîr  
didot, dengê xwe nekira û dest ji guhanên mîh berneda, hingê Apê  
Xelef  
jî dest ji guhanên bêrîvanê bernedida û ew didotin. Apê Xelef gav  
bi gav,

her danê êvarê, şixulê xwe bi pêş de dibir û serê her gavê hunereke nû

nîşanî bêrîvana guhanfirkiyayî dida. Çaxa şixul bi ser diket û bêrîvana xa-

ma, bi tamamî, mîna pezên Apê Xelef, dibû heyrana deng, bilûr û tevgera

33

destên wî ko ne bi tenê hosteyên lêxistina bilûrê, lê herweha firkindina

memikan bûn jî, hingê Apê Xelef, dîsan di wexteke çê de, bêrîvan xewle

dikir û hunereke nû ji hunerên xwe yê bêhejmar nîşanî wê dida; doxîna

şalên xwe ko hertim sist bû, vedikir û berî ko bêrî xelas bibe û tava hêle-

sor a danê êvarê here ava, tiştê xwe yê din ko li gora gotinên xêrnexwazan, mîna lingê wî yê sisiyan bû, nîşanî bêrîvana dilnêrm dida.

Devê xelkê ne doxîna Apê Xelef bû ko însan bikaribûya sist bikira yan

jî bişidanda. Xelk dipeyvî û digot ko hunerên Apê Xelef zahf bûn, destekî wî li ser peleguhê wî, destekî jî li ser doxînê, ew gav bi gav li we-

latê kurdan digeriya û hem digot hem jî tovê xwe direşand. Piştî ko tov

hêşîn dihatin, dibûn zarok û zarok jî mezin dibûn, tevî bêrîvana ko êdî

bûbû dayikeke guhançilmisî, bi qîrevîrê, nefes lê diçikandin, hingê Apê

Xelef nivê şevan, doxîna xwe dişidand, bilûr û gopalê xwe digirt, bi dizî-

ka, piştî xwe dida warê tovê û berê xwe dida warên nû yê bi bereket ko

tijî bêrîvan bûn.

Ev hemû riwayet bûn ko me carina dibihîstin, çiqas rast, çiqas derew,

kesî pê nizanîbû. Gava min êdî bîr bi çerxa dinyayê bir, hingê Apê Xelef

kalekî jar, diranketî, porweşiyayî, lingekî wî kulek, rîh û simbêlên wî zer-

bûyî û xûzikderketî bû. Gerçî wî hê jî destê xwe yê rastê çu carê ji ser doxî-

na xwe ranedikir û bêyî ko haya wî jê hebe, hertim destê xwe dibir ser gu-

nikên xwe yên êdî qermiçî û ew bi kêfxweşî difirkand, lê hingê li dora me,

ji bilî Gulîzera ko bi qasî heyşt, neh salan bû, çu jin, keç, bêrîvan û evîn-

dareke xama ya dilnêrm nîn bû, ko wî jê re stran bigota û memik û hêtên

wê bifirkanda. Tevî ko wî navên me tevlîhev dikir û carina bi hin navên

din ko me nebihîstibûn, bang li me dikir, ji bilî me hersiyan çu zarok jî

nîn bûn. Û wî hew dev ji welatê Cizîrê berdida û diçû deverên din, bêgu-

man heke em stranên wî nehesibînin, ji ber ko ew hertim, bi dengê stran

û çîrokên xwe, diçû deverên din ên welêt.

Bi tenê em hersê zarok hebûn, du zarokên sêwî û zarokekî hem sêwî hem êtim. Diya Heme û Gulîzerê ko navê wê yê eslî jî Bêrîvan bû, wefat

kiribû. Dîsan li gora gotinan, çend roj bi dû bûyina Heme re, Apê Xelefê

doxînsist ko hertim di nav mîz, rêx û zibilên pêz de bû, lingê xwe yê



sisyan xurandibû û ketibû hembêza dayika reben a birîndar û bûbû  
se-  
beba mirina wê. Gulîzera ko êdî di wî umrê xwe yê kicik de bûbû  
hek û  
dayikek, diya xwe dîtibû, lê Heme, mîna min, bêyî ko carekê  
ronahiya  
rûgeş a dayikekê bibîne, mezin dibû.  
Ziman bêhestî bûn û qala »rindê û kewên« Apê Xelef dikirin. Ji lewre  
34  
mebesta Apê Xelef bi »wê rindê« û bi »wê kewa dilsotî«, çî bû û wî  
çêla kî-  
janê fikir, kîjan hatibû bîra wî, min ji dengê wî yê wê berbangê  
dernex-  
ist. Gelo wî çêla dayika Heme fikir? Yan bêrîvaneke din ko ji bîra wî  
nediçû? Min nizanîbû, lê belê min bi tişteki dizanibû; her çaxa ko  
Apê  
Xelef strana Cizîrê bigota, hingê bûyereke girîng diqewimî. Mîna  
dengê  
wî, stranên Apê Xelef jî li gora dewr û dewranan bûn. Wî her stranê  
li her  
derî û her wextê nedigot. Her stran xwedî cîhekî diyar û wextekî  
misoger  
bû. Min, Heme û Gulîzerê bi gelek stranên Apê Xelef dizanîbûn.  
Gava  
wî stranek digot, me jê derdixist ka wî bi çî mebesta ew digot.  
Mebesta  
strana wê sibê ya Cizîrê, roja nû ya biharê bû, ko hê bi tîrên çîkî sor  
dinya  
venegirtibû û li ser çemê Dîcleyê leylan nedabû.  
Gava min çavê xwe vekir û li Heme ko li aliyê din ê jûrê, bi nefeseke  
kûr, dinivist û lehîfa hirî ya belek ji ser xwe ve avêtibû, nihêrî, hingê  
bi

tenê rêzeke stranê li ber guhê min ket; ez derime cem mîrê Botan...  
Tevî  
ko hê xew li ser çavê min bû, ez li rêzê fikirîm. Bi gumana min, Apê  
Xelef  
ko bi deng û gotinên xwe hem xelkê hêrs dikir hem dida kenandin,  
hem  
qirf û henekan vediguhezand guhdaran hem jî ders û tecrubeyan,  
hem  
pez dibirin ser avê hem bêrîvan dibirin cîhên xewle, dîsan, mîna her  
carê,  
bi gotinên stranê lîstibû. Ji ber ko »ez derime« di strana Cizîrê de  
nîn bûn,  
bi tenê »mîrê Botan« hebû. Çima Apê Xelef »ez derime« lê zêde  
kiribû?  
Sebeb diyar bû, ji ber ko ew roj, rojeke xas bû. Bi saya gotinên  
lêzêdekirî  
yên strana bicoş a Apê Xelef, hate bîra min ko wê rojê Mîr ê bihata  
ser  
hukim û bibûya mîr.  
Heke heşê min ê kal niha min nexapîne, hingê umrê min li dora şeş,  
heftan bû û ew roj jî ne bi tenê roja destpêka hukimdariya Mîr, lê  
herwe-  
ha roja Newrozê bû. Min xwe da hev û ez ji nav cîhan derketim.  
Hemeyê  
fisgenî ko bi tir û fisên xwe hewayê mezelê me yê biçûk  
herimandibû, bi  
fisefis li ser doşega hirî ya nerm diniviya. Ez bi gavên sivik ber bi  
pencerê  
çûm da ko wê vekim û tir û fisên Heme bi hewaye paqij ê çemê  
Dîcleyê  
ji xwe bi dûr xînim. Lê berî ko ez pencerê vekim û li çemê Dîcleyê ko  
hinekî ji pencerê bi dûr li ber min, mîna marekî fetloke çiv dida, bini-

hêrim, min li pêşiya xwe, li derpiyê xwe yê spî nihêrî. Li pêşiya derpiyê

min konekî biçûk hatibû vegirtin. Teresê hacetê min ko hingê min û Gulîzerê jê re digot »bilo« mîna lingê sêyemîn ê Apê Xelef serî rakiribû.

Min şeqamek avêtiyê û jê re got, teres, ma tu bûyî lingê sisiyan ê Apê

Xelef ko tu weha, biwext-bêwext, derpiyê min diqulipînî ser konekî spî

yê koçeran? Ma te çu fedî û ar nîn e?

35

Heye ko min hingê welê, mîna însanekî mezin ev gotin negotin û erzê

biloyê reben neşikand, kitekit nayên bîra min, lê gava însan hertim tiştine

balkêş dibihîse û li wan difikire, bivê nevê, ew hem tên heşê însên hem

xewnên wî û hem jî tên ser lêvên wî. Piştî şeqamê min pencere vekir û

hewa derve ko ji hewayaya hundir a genî ko ji hûr û pizûrên xetimî yên

Hemeyê gemarî derdihat, gelekî cihê bû, kêşand hundirê xwe. Bayekî

sivik ê şerqî rûyê min ko bi birîna şûrê sor bûbû du bir, birî. Ro hê hilne-

hatibû, lê sorahiya tîrêjên royê li pey Cûdiyê û çiyayên din ko li dûrahiyên çemê Dîcleyê dixuyan, rengêkî nû didan hawîrdor. Niha tevî

dengê strana Apê Xelef, dengên nû yên tebiyeta ko kirasê xewê ji ser xwe

davêt, dikete ber guhê min; dengê sivik ê ba, nefesa axa biharê ko zik lê

qelişîbû û hêşinahiyêke bor jê dihate der, deng û pêjnên çem û çiyayên  
dûr ko hîs û hestê azadiyê digîhandin min, dengê çiqil û pelên darên  
bî û  
spîndaran ko bi bayê sibê diliviyên û pêjna giyayên kesk ê tarî ko bi  
dilopên xunava ko ketibû erdê, dibiriqîn. Ava çêm, hinekî xwarî min,  
bi  
rengê ronî yê paqij, bi hêdîka, diherikî. Li milê din ê çêm celeb bi  
celeb  
xanî, qesr, qonax û xan, bi rengên xwe yê reş û spî dixuyan. Li pey  
wan  
jî çiyayên bilind ko serê wan bi mij û xumameke tenik hê jî hinekî  
tarî bû  
û sînga wan bi darên gwîz, zeytûn, bî, spîndar û tûyan hêşîn dikirin.  
Ev  
bergeha hanê ko Yezdanê dilovan li ber çave min ê sax, bi comerdî  
radix-  
ist, li roja nû ya pîroz dihat. Şefeq, rengên teze û jîndar ên roja nû,  
bîhna  
giya û kulîlkên hawîrdor ez sermest kirim. Bergeha ko dê bi dû re  
bibûya  
kahniya keder, hizîn, hesret û hêviya min û bibûya hevalbenda ser-  
pêhatiyên min, wê berbangê, li wir, li ber çavê min bû. Mîna ko ez  
xwe  
bispêrim tebiyeta welatê çemê Dîcleyê, min çavê xwe girt û serê  
xwe ko ji  
bîhna tir û fisên Heme gêj bûbû, ji pencerê derxist, dirêjî derve kir  
da ko  
dengan bêtir bibihîsim û hewayê paqij bêtir tenefus bikim.  
Deng, pêjn û hîsên roja nû quweteke nû dan mêjiyê min ê zarok û  
min  
xwe zînde û bextiyar hîs kir. Her cara ko ez xwe zînde û bextiyar hîs  
dikim,

di heşê min de sed fikir û ramanên ecêb, balkêş derin û tîn. Hingê  
jî welê  
bû, bi best û hestekî mezin min dil kir ko ez bibime ba, bibime dengê  
bê  
da ko ez xwe bi hemû dengên tebiyetê bigihînim û dengê xwe û  
dengê  
wan bikime yek. Hê welê ez bi best û hestên xurt jixweveçûyî  
ketibûm nav  
gumanan, ji aliyê mezêl dengê hat. Bêşik dengê Heme, dengê tir û  
fisên  
wî bû. Tireke dirêj bi çend dangan ko ne kêmi dengê topên  
osmaniyan  
bûn, jê diçû. Min ê çî bikira? Bêyî ko ez wî fistûjê segê segan ji xew  
hişyar  
bikim, nifir û çêr li ser lêvên min, ez ji mezêlê derketim.

36

Apê Xelef, serşivanê şivanên hemû welatê Cizîra Botan, li wir, li ser  
doşgekê rûniştî, piştî wî ya hinekî xûzikî bi min, strana wî li ser  
zimên,  
nanê sêlê yê hişk hûr dikir û direşand nav tawika xwe ya fireh.  
Mezela me  
li milekî mezela Apê Xelef bû. Mezela Gulîzerê ko hem mezêl hem  
mit-  
bax bû, li milê din bû. Ew herdu mil li mezêlê Apê Xelef ko tê de ji  
bilî  
du mehfûrên dirêj, coteke doşekên hirî, çend bahlîf, du lehîf, tasa  
avê,  
misînê avdestê çu tekbêrên malê nîn bûn, digîhan hev. Apê Xelef  
beriya  
me hemûyan hişyar dibû, paşê Gulîzer, paşê ez û piştî min jî Fistûj.  
Apê Xelef ko welê dixuya çûbû axurê, mîh dotibû, tawika xwe tijî şîr  
kiribû, bi dengê nizm digot;  
Çûme Cizîrê lê, lê, lê, lê

Lê, lê, lê, lê

Ax Cizîra Botan...

Ez, Biroyê Sêwî ko li ber destê Apê Xelef mezin û bi dengê wî terbiye dibûm, min jî beşdarî li dengê wî kir û bi dengê xwe yê zirav bersîv dayê;

Çûme Cizîrê, Cizîr wî alî

Keçikên Hebîbiyan werine vî alî

Keçikên Mêrdîniyan herine wî alî

Gava Apê Xelef dengê min bihîst, tavilê ew zivirî, rabû ser piyan, kenekî

germ li ser rû, bi gavên govendê û bi lingê kulek, hate nik min, ez hem-

bêz kirim û bêyî çu gotinê, stran domand;

Ji kerba delalê lê, lê, lê, lê

Ketime vî halî, vî halî, vî halî...

Wî gotin dîsan anîbû ser delaliyan. Bi qasî çendekê welê yek ji wî, yek ji

min, me li ber hev got, heta Gulîzer, di destan de sîniyekê, hate hundir,

nik me. Me dil hebû dev ji stranê berda, lê Gulîzera ko meşa wê mîna

govendekê bû û ji deng û govendê gelekî hez dikir, tavilê, sînî danî erdê

û dest bi lîstikê kir. Govend jî li stranê zêde bûbû; roja Newrozê, roja hukimdariya Mîr hingê, di destpêka roja nû de, li nik me, mala Apê Xelef, dest pê kiribû. Fistûj jî ji dangan hişyar bû û hat, tevî me bû.

Ez bawer im, we ji niha ve bîr bi hal û hewalê mala me biriye; mala me,

37

heke ne mala tiredînan bûya jî, ne mala b'aqilan bû.

Bi qasî demekê, heta Apê Xelef derkeve û here, welê li ser lîngan, bi

gotin, stran û dîlanê, me roja nû, Newroza qedîm, hukimdariya qehîm,  
bi ûsil û awaza xwe, pîroz kir. Piştî ko Apê Xelef nan û şîrê xwe li ser lin-  
gan, bi kevçiyê darîn xwar, wî doxîna xwe şidand, şal û şepikên xwe dan  
hev, gopalê xwe ko li ber devê derî bû, xiste destê xwe û ji derî derket û  
çû. Lê berî ko ew ji derî derkeve, li me vegeriya û gote, zarokno, cil û  
bergên xwe yên paqij li xwe bikin, xwe bidin hev û herin mala Mam Sefo.  
Mam Sefo û malbata wî, ji bo taştêyan, li hêviya we ne. Ez ê jî kerî teslîmî  
şivanan bikim û bê mîla Mam Sefo.  
Dengê çemê Dîcleyê herî xweş ji mala Mam Sefo dihate bihîstin, bêgu-  
man heke em Birca Belek nehesibînin. Mala Mam Sefo ko ji xaniyekî bêtir bi qesrekê dişibiya, li ber devê çem bû. Avahî, tevî mezel, meclîs,  
dîwanxane, kitabxane, mitbax, jûrên bêhejmar, şaneşîn, hewş û eywanên  
fireh mîna yek ji qesrên Harûn Reşîdê Bexdayê, bi spehî û bedewî, dirêjî  
avê dikir. Xanî bi du qatan û bi kevirên reş ên ferîşandî hatibû lêkirin, lê  
ew dirêj, bi qasî ko çav didît, dirêj bû. Ez bawer im, avahiya herî dirêj ko  
min di heyata xwe de dîtiye, mala Mam Sefo bû, heke însan qonaxa Mîr  
û yên osmaniyan nehesibîne. Mal ji çend milan hatibû pê, milê mezelên  
razanê, milê civat û meclîsê, milê şixul, ders û îlmê, milê qewraş û

berdestan û milê mezelên mêvanan, nêçîrê, xwarin, vexwarin,  
şuştin û  
lîstika me zaruwan. Hema çî bigire her roj, danê êvaran, çaxa Mam  
Sefo  
li dîwana Mîr, xanima wî ko navê wê Senemxan bû, di nav cîhan de  
bû,  
em, ez, Gulîzer û Heme, diçûn mala Mam Sefo da ko tevî hevalên  
xwe,  
zarokên Mam Sefo, Migo û Armê bilîzin. Bi tenê du milên malê ko li  
qa-  
ta jêr bûn, ji bo me vekirî bûn, milên mitbax û berdestan. Ê hewşa  
malê  
ko ne li aliyê çem, lê li aliyê din ê xênî bû. Milên din ko piraniya wan  
li  
qata jorê bûn, li me qedexe bûn. Jixwe gava Mam ko hertim bi  
şixulekî  
girîng ê mîrekiyê mijûl bû, li malê bûya, diviya herkes gelekî bêdeng  
û  
bisemt bûya.  
Mam Sefo û malbata wî ermenên Cizîra Botanê bûn, ko ji bav û  
kalan  
di xizmeta mîrekiyê de bûn. Navê Mam Sefo, Stephan Manolgiyan,  
navê  
Migo, Migirdîç û Armê jî Armenuhî bû. Navê xanimê jî, jixwe, me  
gote.  
Lê me, ehlê Cizîra Botanê ko ji kurtkirina navan hez dikir, mîna  
hemû  
navan, navê wan jî kurtir kiribû. Heye ko ez şaş im, lê bi qasî ko ez  
dizan-  
im û min dîtiye, însanê herî têgihîştî û zana yê hemû welatê Cizîra  
38  
Botanê Mam Sefo bû. Ji zimanê ermenî, kurdî, osmanî, farisî û erebî  
pê



ve, wî bi zimanê îtalî, fransewî, îngilîzî û hinekî jî bi yê yewnanî û  
latînî  
dizanîbû. Wî dunya dîtibû, war û welat geriyabû, li Stenbol, Venedîg  
û  
Parîsê xwendibû, îlmên cihê, tevî kitabên miqedes ên cihû, file û  
misil-  
manan, xetim kiribû, hal û hewalê gerandina karên dewletê,  
birêvebirina  
pêwendiyên aborî û biserxistina hunera şer û aştiyê, bi hostehî, hîn  
bûbû.  
Wî dewlet, saray û sultanên osmanî ko hertim di nav dek û dolabên  
veşartî yê vegirtin û kavilkirinê de bûn, baş dinasî. Mam Sefo ne bi  
tenê  
osmanî, lê padîşahên farisî ko bi pozbilindî, derew û bêbextiya xwe  
nas  
bûn, eşîr, serekeşîr û şêxên ereban ko hertim di nav xirecîreke vala  
û pûç  
de bûn û mîr û mîrekiyên din ên kurdan ko nikaribûn dost û  
dijminan ji  
hev veqetandina û dijminê dostên xwe, ji ber hesûdî û neyariya mîr  
û  
mîrekiyên cîran, dostên dijminê xwe, yanî dostên dewletên  
desthilat  
bûn, ji heft bavan û vir ve, yek bi yek, nav bi nav, kite bi kite, dinasî.  
Ew  
hem dostekî dilsoz ê mîrên Cizîra Botan û xelkê kurd bû, hem jî  
dostekî  
yekta yê ehlên din, ermen, asûr, suryan, keldan, nastûr, yaqûbî,  
cihû,  
elewî, yêzidî ko di nav me de diheyat û hertim bi êrîşên xedar ên  
desthi-  
latên cîran dihatin qirkirin. Nav û dengê wî li hemû welatê osmanî  
û ro-

jhilat belav bûbû. Mîrên din ên kurdan, bi kesereke kûr, digotin;  
dewsa

ordiyêke bi sed hezar neferî, xwezî şêwirmendekî me yê mîna Sefo  
hebûya...

Lê Mam Sefo şêwirmendê mîrekiya Cizîra Botan ko bi erdê xwe yê  
fireh, bi mizgeft, dersxane, medresên xwe yê navdar û bi xan,  
bazar û

karxanên xwe yê mezin, yek ji mîrekiyên herî girîng ên kurdan bû.

Ew

mîna bav û kalê xwe alîgirê mîrên botî ko ji wan re, ezîzî dihate  
gotin, bû.

Mam Sefo ko riya heyata min da ser vê xeta ko gihîştîye îro,  
zanayekî

bêpayan bû, ko bi bîhnfirehî dida pey kitekitên bûyer, pêwendî, fikir  
û

tecruban; bi hest û xurtî dikete nav şixulên çareserkirina gelşên  
siyasî,

dînî û civakî; bi hez û coş heş, ruh û dilê xwe ji huner, edebiyat, zanîn  
û

musîkê re vedikir û bi heyecana zarokekî dikete nav dewr û  
dewranên bi-

hurî yê destan, rîwayet û çîrokan.

Mam Sefo, yekî girsî qalind, xanima wî Senemxan jî bervajiyê wî,  
yeka

jarî zirav bû. Li gora gotinan, ko mîna Apê Xelef, xêrxwaz û  
xêrnexwazên

Mam Sefo jî gelek bûn, gava Mam Sefo ji welatên xerîbiyê  
vegeriyabû,

hingê xanimeke îtalî ji Stenbolê pê re bû. Xanima Mam Sefo ya şox  
û

şeng û bi bal û endam ko di demeke kurt de, bi bedewî, kîbarî, kêf  
û

henekên xwe deng dabû, hînî heyata welatê Botan nebûbû û  
vegeriyabû

39

bajarê xwe yê bav û kalan Stenbolê. Bi dû vegeza xanima îtalî re  
Mam

Sefo ko hingê jî zanayê qesra mîrekiyê bû, Senemxanê ko keça  
patrîkê

dêra ermenan ya welatê Wanê bû, anîbû.

Me zarokan ne Mam Sefo ko hertim li civat, meclîs, dîwan, nêçîr an  
jî

li seferan bû, didît, ne jî xanima wî ko hertim nexweş, merezî û  
bêhal bû.

Carina Senemxan, mîna siyeke tenik ko însan hebûn û nebûna wê  
baş

seh nake, ji qata jorê dadiket mitbaxê, tiştin ji qewraşan re digot û  
dîsan

winda dibû. Migo ko di umrê Gulîzerê û bi qasî bihustekê ji min û  
Heme

firehtir, Armê ko di umrê me de û bi qasî bihustekê ji me jartir bû,  
dayi-

ka xwe zêde nedidîtin. Nexweşiyên Senemxanê çî bûn, me ew jî  
nizanîbûn. Lê ew mîna xeyaletekê her li qata jorê, di nav cîhan de  
bû.

Li malê, ji bilî keya, seyid, şivan, gavan û xulaman ko hertim dihatin  
û

diçûn, bi qasî pênc, şeş keç û jinên berdest hebûn. Di nav malê de  
hertim

tevgereke boş, çûyin û hatineke geş hebû; ji bixêriyan hertim dû  
radibû,

beroş li ser êgir, sînî û teyfik li ser refan hazir bûn, bi telîsan sewze  
û fêkî

dihatin, berx, mî, mirîşk, werdek serjê dibûn, bi teştan hevîr dihate  
strandin, bi sîniyan nan dipijandin, şîr eyvan dibû, rûn û nivîşk ter

dibûn, penêr dihêlî, cil û berg, firax û teyfik û tiştên din ên malê dihatine

şûştin, xalîçe û mehfûr paqijkirin, mezel, hewş, eywan, şaneşîn maliştin.

Xwarin, vexwarin, çerez, şîrînahî û zexîreyên zivistanê ji havînê de hazir

dibûn û diketin nav tûr û kûpên zerzemîna malê. Herweha ji şîrê pezên

Mam Sefo ko bi qasî sedî bûn û Apê Xelef, tevî pezên Mîr û yên sereskerê

Mîr, dibirin çêrê, her celeb xwarin û vexwarinên şîr, firo, mast, to, dew,

nivîşk, rûn, penîr, sal donzdeh meh, çêdibûn.

Gava em, ez, Gulîzer û Heme, wê roja Newrozê gihîştin mala Mam Sefo êdî ro li taştêyan bû. Ji ber xirecira Gulîzer û Heme em dereng mabûn. Apê Xelef ko hertim weha gotineke tewş digot û rûyê xwe badi-

da diçû, dîsan bi gotina xwe xirecîrekê xistibû malê û çûbû. Cil û bergên

xwe yên paqij li xwe bikin, wî gotibû. Cil û bergên paqij ko gotina wan

hêsan, peydakirina wan zehmet, li kû bûn? Hemeyê ko bi tir û fisên xwe

em gêj kiribûn, îcar jî, bi xirecira xwe ya cilên paqij em gêj kirin. Gulîzera

reben ê ew ji kû peyda bikirana! Ne cil û bergên me yên paqij û ne jî yên

nepaqij hebûn. Cil û berg bi tenê yek bûn, yên li me ko êdî riziwayî bûn.

Cotek derpiyên bideling ko hertim bi çilkên mîzê û lekeyên tahretê pêşî

û paşîya wan zer dikirin, cotek şal ko ajnoyên wan êdî spî dikirin, kirasekî

tenik î spî û şepikekî sor î tarî ko êdî tayên wan ji hev diçûn... Kincên  
me,  
hemû ev bûn. Gava Gulîzerê ew, di rojên cilşo yên mala Mam Sefo  
de, ji  
40  
bo şûştinê, dibirin çêm, nik qewraşên mala mezin, min û Heme  
kulavên  
sor ên Apê Xelef ên şivaniyê li xwe dipêçan û diketin nav xeyalên  
rojên bê  
yên bi cil û bergên zêde.  
Û wê rojê Heme diqîriya ser Gulîzerê û digot, min cil û bergên nû û  
paqij divên! Bavo jî ewaha gote me! Newroz e, pîroz e, cilên nû  
gerek e!  
Axir, piştî xirecîreke çendekê ko em hersê jî jê bêzar bûn û westiyan,  
cil  
û bergên me yên heyî li me, me da rê û em çûn mala Mam. Ji ber  
bextê  
me yê çê, sifre hê li erdê bû, ji mitbaxê bîhna nanê sêlê yê nûpijandî  
û şor-  
benîskê difûrî, li ser sêniyan her texlîd penîr, penîrê ter, pûngê,  
sîrikê, he-  
landî, şoravkê, rîsî û texlîdên nivîşk, mast, dims û hungivê hebûn.  
Migo  
û Armê ko ji sifrê rabûbûn, bi bihîstina hatina me, cil û bergên wan  
ên  
nû li wan, rûyê wan geş, vegeriyan mezelê xwarinê ko li kêleka  
mitbaxê  
bû. Rûgeşî û germahiya wan tavilê veguziya dilê me jî û bîhtengiya  
ko  
Fistûjê rûtirş anîbû pê, bi carekê winda bû. Min dest bi stranekê ko  
min  
di cîh de, bi gotinên xwe yên xeşîm, li hev anîbû, kir.  
Newroz e, Newroz e

Xweş roj e, pîroz e  
Dinya geş e, bihar e  
Dilê min germ e, dîlan e...  
Ji bilî Heme, herkesê ko li wir bû, li çepikan xistin û em rûniştin ser sifrê.  
Armê ko gelekî bi dayika xwe ya esmer dişibiya û mîna skeletekî jar û zi-  
rav bû, li nik min rûnişt. Ew jî hevala min a lîstikan bû û mîna Gulîzerê  
wê jî di lîstikên me de »bilo« dîtibû û jê re, mîna Gulîzerê, digot »bilo.«  
De zûke, bixwe, em herin bilîzin, wê got û tasika hungiva zer î zêrîn a  
welatê Hekaran anî ber min.  
Min ajnoyeke xwe danî erdê, dirêjî sifrê bûm, tiliya xwe xiste nav tasikê  
û tiliyeke hungiva şêrîn a ron bir devê xwe û gotê; îro Newroz e, em ê,  
herkes, hemû bi hev re bilîzin.  
Mayrîg zahf nexweş e, wê got, Mayrîg dixwaze, em herine balê.  
Hayrîg li kû ye? Min jê pirsî.  
Bi xêra çûyin, hatin û lîstikên me, ez gotinine ermenî hîn bûbûm.  
Armê çêl li dayika xwe, min jî, bi henekî, li bavê wê dikir.  
Hayrîg li kitabxanê ye, wê li min vegerand, tişteki dinivîse.  
Piştî ko me zikê xwe têr tepisand, tevî du qewraşên malê, em hilkişiyân  
qata jorê, mezelê Mayrîgê ko tê de têkber ne zede bûn û jê bîhneke mîna  
41  
bîhna misk û emberê difûriya. Senemxana zerbûyî li ser textekî razanê yê  
teng, di nav nivînên paqij ên çîkî spî de bû. Gava çavê wê bi me ket,

kenekî diyar li ser rûyê wê yê gelekî zirav diyar bû û wê xwe hinekî da hev,

bi alîkariya qewraşekê, balîfên pişta xwe rast kirin û qama xwe bilind kir.

Kirasekî şevê yê spî û neqîşkirî lê, xaçeke stûr a zêrîn jî bi stûyê wê ve bû.

Li ber serê wê maseyeke dirêj ko resmekî nûranî yê Mesîh, zengilekî kiçik

ê hesinî, kitabeke reş a cîldkirî, tasek û teyfikeke kûr lê bûn, hebû.

Li

hember me jî pencereyeke hinekî vekirî ber bi çemê Dîcleyê hebû.

Dengê

ava Dîcleyê mîna straneke xweş û nerm a Newrozê bi guhê me diket û

ronahiya ko ji pencerê dirêjî hundir dikir, heta nik me, ber derî dihat.

Oda spî di nav gewheriyeke berbanga wê roja girîng de bû.

Wê herdu destên xwe vekirin û bang me kir; werin gidîkên min, werin...

Gidîk, berxik bû, em berxên wê ko di yarî û lîstikan de hîç ne mîna berxikan bûn, ber bi wê çûn. Armê bi hedîka xwe avête hembêza wê. Bi

qasî çendekê wê tiliyên xwe yên zirav di nav porê Armê de gerandin, geh

li me, geh li Armê nihêrî û bi zimanê xwe duayek xwend; hayr, vortî, hokîn sûrp, astvadz... Du rondik ji çavên wê ber bi jêr bûn, lê tevî rondikan, ken li ser rûyê wê bû.

Cejna we pîroz be, wê bi kurdî, bi dengekî gelekî sext got û bi ermenî domand, park dîroç, park dîroç...

Em yek bi yek, bêyî ko çu dengî derxînin, bi edeb, ko di esasê xwe de

ne şixulê me bû, çûn destên wê. Çaxa dor hate min, wê bi kêfxweşî gote,

dixa were, dix a were. Lê gava ez çûm destên wê yên qermiçî û zirav  
û wê

jî dil kir eniya min ramûse, wê madê xwe tirş kir.

Ew çi bîhn e bi ser te ketiye, zo!.. Wê gote min.

Tavilê ez li Heme vegeriyam, lê min fedî kir ko ez bibêjim, sebebê  
van

bîhnan aha eve ye.

Heye ko bîhna kadîn û axurê be, min bi fedî gotê.

Piştî ko em hemû çûn destên wê, ew li qewraşan vegeriya û gote  
wan;

şekir û diyariyên gedeyan bidin wan, Heme, Biro û Gulîzerê bibin,  
bişon

û cil û bergên paqij li wan kin... De herin, Baron li hêviya we ye.

Gava em ji derî derketin, mîna ko tiştêkî hatibe bîrê, wê bangî min  
kir.

Biro, were Avedaranê bide min.

Çima wê di nav zaruwan de bangî min kiribû, ez pê nizamim, lê min  
dizanîbû ka mebesta wê bi Avedaran-ê çi bû, ez vegeriyam ber  
masê, min

rahişt Mizgîniya Xwedê, yanî Încîla Îsa Mesîh û min ew dayê.

42

Dengê teyrê tawis çawan e? Mîna dengê teyreki goşt xwir, em  
bibêjin êlo,

doxan û bazekî, ko hêlînên wan di bilindahiyên asê yên çiyayên Cûdî  
û

Herekolê de veşartî ne, tîz û dirêj? Mîna dengê qulingekî koçer ko  
di

destpêka biharan de tîz qiraxên çemê Dîcleyê, nerm û xweş? Mîna  
dengê

leglegekê ko mîna qulingan di biharan de tîz û hêlînên xwe li ser  
qubî-

dankên kêleka çem ava dîkin, hişk û nexweş? Mîna dengê qaz û



werdekên çemê Dîcleyê neşêrîn? Mîna dengê şalûl û bilbilên ko di qesra  
Mîr de, li Birca Belek, strana gul û rihanên dibêjin, zirav û bihîstiyar?  
Mîna dengê teyrê sîmir ko di efsaneyan de mîrê teyran e û di her perekî  
baskên wî de huner û neqşên bêhejmar, ronahî û şewqên bêpayan hene,  
xurt û bilind? An jî mîna dengê teyrê zumritî anka ko her pênc sed salan  
carekê dixuye, baskekî wî zêrîn, baskekî jî sor e û ji xulava xwe, ji nû ve  
vedije, gur û kûr?  
Heke we teyrê tawis nedîtibe û li dengê wî guhdarî nekiribe, hûn pê nizanin.  
Min jî pê nizanibû, heta ko ez, di xortaniya xwe de, çûm warê miqedes  
ê yêzidiyan, geliyê Lalêşê yê pîroz û li wir min bi alîkariya neqîş, sûret û  
dîmenan, li xweşikahiya teyrên tawis temaşe kir û bi dû re jî, li bexçê sereya siltanê Osmanî û li qeleha bajarê Xaniyayê ko li girava Girîtê ye, li  
dengê wan guhdarî kir. Lê belê heta wê rojê, ji bo min, dengê teyrê taw-  
is mîna dengê Mam Sefo bû; dengê gur, xurt û kûr. Ez ê di şevbuhêrkên bê de jî çêla dangan bikim, lê bi mebesta dengê Mam Sefo,  
divê ez bibêjim ko dengê gur, xurt û kûr, balkêş e, însan li xwediyê deng  
mêraq dike, bîr dibe ko li pey wî dengî hin mebestên din ên veşartî, hin  
zanînen kûr ên nediyar hene. Gurbûna deng ji heyecanê, xurtbûna wî ji

coşê, kûrbûna wî ji zanîne ye. Heyecan, coş û zanîn, sê celebên  
hîsên in-  
sanî ne ko tahm û renegekî xweş didin heyatê.  
Em vegerin ser wê roja xwe ya pîroz... Piştî ko ez, Heme û Gulîzerê,  
bi  
destên nermik ên qewraşan hatin şuştin, bi bîhnên xweşik bedenên  
me  
hatin mistdan û em ji bîhna mîz, zibil, ka, alif, fis, tir, toz û tebarê  
rizgar  
bûn, me kiras, derpî û cilên nû yên paqij li xwe kirin, tevî du  
qewraşên  
bedenzirav û gavsivik ko hertim bi me re bûn, bêrîkên fireh ên şalên  
me  
yên nû û rengîn tijî şekir, bihîv, gûz û loqim, rûken û kêfxweş, em  
dîsan  
ji pêpelûkên kevirên nehît ên malê hilkişiyar qata jorê û çûn  
kitabxanê,  
warê ko Mam Sefo li hêviya me bû.  
Li ber derî, qewraşan em dan sekinandin, cil û bergên me dan hev  
û  
tembîh li me kirin; li nik Baron bi terbiye bin, xwe melivînin, bi hev  
re  
43  
melîzin, yarî mekin, mepeyivin, bêyî ko ew bi we re bipeyive yan jî  
tiştêkî  
bipirse, bersiv medîne, destê xwe medîna tiştan, şekir mexwin.  
Mîna ko em nedîçûn kitabxanê, nik Mam Sefo, lê diçûn zîndanekê.  
Gava deriyê giran ê kitabxanê, bi herdu milan, vebû û em ketin  
hundir,  
Mam Sefo ko bi bejna xwe gelekî dirêj, bi milên xwe stûr, bi bala  
xwe li-  
hevhatî bû, li aliyê din ê kitabxanê, li ber deriyê şaneşîne yê fireh li  
pê

rawestiyabû û çavên wî li der, li ser ava çemê Dîcleyê, di nav fikir û  
gu-  
manan de, bi hêdîka, bi aramî, qelûn dikêşand. Dûmana qelûna wî  
ber  
bi aliyê şaneşînê bilind dibû. Mam Sefo ko me hertim wî di nav şal  
û  
şepikên spehî û bi taybetî risiyayî yê botî de dîtibû, niha di nav  
kincên  
frençî de bû, çakêt û pantolên dirêj ên boz î tarî, coteke pêlavên reş  
ên  
frençî di pê de, gomlegekî spî lê û qrawateke belek î sor li ber bû.  
Simbêlên wî yê boq ên kizirî mîna her carê ber bi jor badayî, rîha  
wi ya  
kin û qît ko ne mîna rîhên palik ên paşayên osmanî, şêx û melayên  
botiyan bû, bi renekî morî tarî hatibû henekirin. Çavên wî yê  
belek  
kilkirî, porê wî yê bi tayên spî hinekî gewr ber bi paşiyê xweş şehkirî  
bû.  
Gava çavê wî bi me ket, rûyê wî geş bû, bi ken, ew ber bi me hat;  
zaro-  
kno werin, werin... Cejna we pîroz be, roja we bimbarek be...  
Tevî ko Mam Sefo bi gelek zimanan dizanîbû, wî tu carê, mîna  
xanima  
xwe û gelek kesên din ên file, ziman tevlihev nedikirin û bi  
kurdiyeke za-  
hf paqij û edebî ya Cizîra Botanê dipeyvî. Herwekî ko hûn seh dikin,  
kurdiya min ne ewçend kurdiyeke saf a Cizîra Botanê ye, min  
kurdiyek  
ko li stran, gotin û serpêhatiyên min tê, ji devok, lehçe û gotinên  
herê-  
man aniye pê. Lê kurdiya Mam Sefo, bi gotin, ûslub û lezeta xwe, ya  
ehlê

Cizîrê bû. Herçend Apê Xelef hosteyê stran, bilûr û firmandina gunik  
û  
memikan bû, Mam Sefo jî hosteyê hunera axaftinê bû.  
Wî em, yek bi yek, hembêz kirin, ji eniya me ramûsa, şekirên rengîn  
ko  
di nav siniyeke zêrhêlî de bû, dan me û em birin ber deriyê şaneşînê.  
Di heyata her însanî de hin şev, hin roj, hin berbang, hin hingûr hene  
ko ruhê însên vedigirin, riyêke nû didin ber însên û tu carê ji bîr  
nabin û  
mîna siya însên, heta gorê, bi însên re ne. Bayekî sivik ê berbangeke  
ronî,  
tîrêjeke tenik ê danê êvareke aram, taveke germ a rojeke havînê,  
stêreke  
xuricî ya şeveke tarî, çend kulîlkên nerm ên berfeke spî, çend  
dilopên  
baranê yê xunaveke paqij dikarin tesîreke welê li hemû heyata  
însên  
bikin ko însan, heke bixwaze jî, êdî tu carê nikare xwe ji bin bandûra  
wan  
rizgar bike. Ew roja ronî ko êdî ber bi nîvroyan diqulipî, ji bo min,  
rojeke  
welê bû.

44

Em, li kitabxana Mam Sefo, li ber deriyê fireh ê şaneşînê ko vekirî  
bû,  
li kêleka hev, destên me li ser bêrîkên me yê tijî şekir, bi coş û  
meraq, li  
pê rawestiyabûn û me li dengê Mam guhdarî fikir, li bergeha  
havîrdor  
dinihêrî. Çemê Dîcleyê li ber me, bi nazenîn û aramî, diherikî.  
Tîrêjên  
tava germ a roja nû ko êdî Cûdî û çiyayên rojhilat li pey xwe hiştibûn  
û

xwe gîhandibûn bilindahiyên esmanan, li ser ava şîn leylan didan.

Çend

kelekên tijî însanên ko bi def û zirnê û bi dengê bilind stranên

Newrozê

digotin, li ser avê bi hêdîka hêl dibûn û ber bi aliyê jor, qesra Mîr diçûn.

Refekî teyrên mezin, ko ez bawer im, quling bûn, mîna ko ew jî bixwazin

roja nû pîroz bikin, di ser Dîcleyê re, bi nizmahî, difiriyan û dikirin qîre-

qîr. Hinekî ji me bi dûr, li deverên xanên mêvan û kerwanan, mehîn û

hespina dikirin hîrehîr. Qiraxên çem bi rengên têkel ên giya û kulîlkên

têkel ko piranî hilaleyên spî û sor bûn, qulipîbûn ser seyrangeheke rengîn. Reng û dengan hingê ruhê min ê zarok vegirtin. Min guhê xwe û

çavê xwe yê sax da ser deng û rengan.

Piştî çendekê, mîna ko ji nişka ve hatibe bîra min, min serê xwe ji bergeha çem bada û bala xwe da aliyê hundir, kitabxanê.

Evçend kitab!.. Min tembîha qewraşan ji bîr kir û bi dengê bilind û

heyirî got.

Belê, evçend kitab, ji bo îlim, îrfan û zanînê, Mam Sefo li min vegerand.

Ma te ev hemû xwendine, Mamo?

Xwezî, xwezî... lê ne wextê min heye ko ez hemûyan bixwînim, ne jî umrê min têrî dike.

Lê hayrîg dixwîne, varjabed dixwinin. Lê ne Migo, ne mayrîg. Migo bi

tenê li sûretan dinihêre, Armê, çavên wê yên mezin li ser Migo, got.

Kitabxana ko ji hemû mala Apê Xelef mezintir bû, seranser kitab bûn.

Dîwarên spî yên kitabxanê hemû bi refên rengê qehweyî, ref jî hemû tijî

kitab bûn. Her celeb kitab, bi her texlîd rengî li ser refan bûn; biçûk, mezin, cîldkirî, zirav, qalind... Ez ji komê veqetiyam û çûm ber kitaban.

Bîhneke taybetî ya kitaban hebû, ko hinekî bi bîhna hirmiyeye çilmisî yan

jî bi bîhna gendoreke qelişî ko li ber tavê maye û bûye tirşokî, dişibiya.

Herfên li ser pişta kitabên ko li hember min bûn, herfên ecêb bûn.

Min

herfên mihemedî dinasîn, lê ev herf ne mihemedî bûn. Min rahişt kitêbekê û ew ji ref kêşand. Di rûpela yekemîn a kitaba qalind û cîldkirî de

sûretê kalekî rîhdirêj û di binî de jî rêzine bi wan herfên ecêb hebûn.

Min

tiliya xwe ya dirêj a destê rastê bir ser herfan û çend caran tilî bir û anî.

45

Evne, tîpên latînî ne, Mam Sefo, ko bédeng hatibû û li pey min rawestiyabû, got.

Tu bi van herfan dizanî, Mamo? Min li rûyê wî yê gulover nihêrî û pirsî.

Helbet, wî, rûgeş, got, tîp cûre bi cûre ne, ji bilî van jî tîpine din hene, tîpên ermenî, grekî, rûsî, sînî... Ji yên sînî pê ve, ez bi hemûyan dizanim.

Ji lewre serê hayrîg evçend mezin e, Armê bi dengê xwe yê zirav got.

Ez hertim li mala Mam Sefo bûm, lê çu carê neçûbûm kitabxanê. Ew cara yekemîn bû ko ez li wir bûm. Kitabxane bi çu mezel, jûr, dîwan û

meclisên ko min dîtibûn, nedişibiya. Wê hingê ruhiyeteke gelekî xas da

min ko min çu carê hîs nekiribû, mîna ko ez li cîhekî miqedes, li  
malek  
ko însan ruh û heşê xwe tê de geş dike, li nexweşxaneyek ko însan  
tê de  
birînên xwe yên nefsi dicebirîne, bûma. Gerçî umrê min ne zêde bû,  
lê  
heta hingê min di heyata xwe de, bi tenê du kitab dîtibûn, Qurana  
kerîm  
ko li mala Apê Xelef, li dîwêr hilawestî bû û çu carê destê kesekî lê  
nediket  
û Încîla Mesîh ko hertim di destê Senemxanê de bû. Niha, li  
kitabxana  
Mam Sefo, li ber min deryayeke ronî û bêdawîn ji kitaban vedibû.  
Li erdê çend mehfûrên bi neqşên rengîn ên welatên Hekar,  
Behdînan  
û Wanê hebûn. Li dîwarê hember min, li jorî ref û kitaban çend le-  
wheyên rengîn ên bi destan çêkirî dixuyan. Kitabxane ronî bû,  
tîrêjên  
tavê, bi comerdî, dirêjî hundir kiribûn û bûbûn hevalên me yên  
dilsoz ko  
roja me hîn bêtir geş dikirin.  
Ez dîsan ji komê veqetiyam û çûm ber refên hember û min li  
lewheyên  
nihêrî. Lewheyek ko di nav çarçeweyê neqîşkirî û zer de bû, ya  
Îsayê  
Mesîh bû. Yeka din sûretê dêreke kevnare ko di nav çiyên de, li ser  
girekî  
bilind bû, berpêş dikir. Li ser birca dêrê ya zingilê, xaçeke stûr û li  
kêleka  
dêrê jî çend mehîn dixuyan. Du, sê lewheyên din jî li kêlekên wan  
hi-  
lawestî bûn. Lê lewheya ko herî zêde bala min kêşand, lewheyeke  
stûr a

teyrekî bû. Teyrekî ko bi qasî qazeke mezin bû û stûyê wî bi yê werdekekê, lingên wî bi yên leglegeke, nikulê wî bi ya qulingekî dişibiya,  
per û bask vekirî, di lewhê de dixuya. Min teyrekî weha xas ko ji çend teyrên cihê hatibû pê, hê nedîtibû. Per û baskên teyr gelekî balkêş bûn,  
hem per û bask ko stûr bûn hebûn hem jî li pey teyr ji perên dirêj sîwaneke bilind yan jî konekî vajî yê gewendeyan hebû. Ê hemû per bi rengên têkel, mîna keskesora piştî baranên boş, bedewiyeke bêpayan di-hanîn pê. Teyr, ne bi heft rengên keskesorê, lê bi heftê û heft rengan xemilîbû. Ez li ber lewhê rawestam û bêdeng, bêlebat, min lê nihêrî.  
Ez ji  
46  
her tiştên wê roja nû ko ez weha kite bi kite qal dikim, bi dûr ketibûm û bi lewhê re bûbûm yek. Çavê min, kite bi kite, per bi per, reng bi reng, neqîş bi neqîş, li ser teyr dizivirî.  
Eve teyrê tawis e, Mam Sefo ko dîsan hatibû kêleka min, got, teyrê reng û neqşan...  
Li welatê Cizîrê ji van hene, Mamo? Min jê pirsî, bêyî ko ez rûyê xwe ji lewhê badim.  
Naxêr, lê li welatê başûr, Lalêş û Nînovayê hene. Ev teyrê hanê remza bav û kalên te ye.  
Bav û kalên min? Min bi meraq lê vegerand.



Belê, bav û kalên te, yêzidî... bîrewerên kevnare yên dînê Zerdeşt...

Lê

belê, êdî xwe bidin hev. Biro, Heme û Migê, hûn ê bidin pey min.

Em ê

herin dîwana Mîr, ji bo pîrozbahiyan... Botî bi mîrê xwe, Şervanî bi şûrê

xwe, Hekarî bi ra û tekbîra xwe... De zûkin, em herin nik Mîrê xwe...

Dengê bêdengiyê jî yek ji dengên bêhejmar ên heyata min e. Her cara

ko çêl tê ser bav û kalan, Laleş û êzidiyan, mîna niha, şopa şûr a rûyê min

diêşe, germahiyek ko nefesê li min diçikîne, bi ser min de tê, dengê min

tê birîn û dengê bêdengiyê zora hemû dengên din dibe, wan difetisîne.

Dengê bêdengiyê seh nabe, hîs dibe; ne bi guhan, bi ruh û can tê bi-hîstin. Ji ber ko dengê bêdengiyê ji şûrê osmanî, ji derbên şûrê çavsoran

û ji xwîna mazlûman hatiye pê.

Çavê min ê kor jan dide.

Şopa şûrê tûj ko rûyê min qulipandiye ser sûretê mirinê, diêşe.

Bedena min a girs ko hew xwe radigire, bi kela êşa birînên do û îro, dilerize.

Heşê min ê westiyayî dengê min dibire û min hildigire dibe.

Bi qesta bîhnvedan, av vexwarin, mewîj xwarin û cixare pêçanê,

ez derim wê roja şûrê tûj, ko rojek ji rojên welatê bav

û kalan e.

Bêdengiya ko ji şerm û fediyar e, êdî dangan vedigire.

Heke we dil hebe, heke we hunera bihîstina dengê bêdengiyê

hebe, fermo, werin dengê bêdengiyê ko êdî li dar e.

Deng.

Dengê kundekî nivê şevan ê mûsîbetê.

47

Dengê dîkekî berbangê yê miyeseriyê.  
 Dengê wawîkekî çolê yê qeza û belayê.  
 Ê dengê dayik, dayika şîr û hembêzê.  
 Reng.  
 Rengê ronî yê welatê bav û kalan.  
 Rengê tarî yê çiyayên Şengalan.  
 Rengê kesk ê bihara gundê yêzidiyan.  
 Ê rengê gewher ê dayik, dayika hebînê û evînan.  
 Bîhn.  
 Bîhna axa sor a nûhişyarbûyê.  
 Bîhna rihan, sosin, nêrgiz û gulên nûbişkovî.  
 Bîhna kulîlkên spî yên darên behîvî.  
 Ê bîhna dilovan a dayik, dayika rehmet û delalî.  
 Bi tenê bîhna nerm a hêşinahiya biharê û ronahiya berbangê.  
 Bi tenê dinya bedew û hawîrdora spehî ya şewqê.  
 Kulîlk, çiqil, pel, dar, ber, heywan.  
 Çivîk, vîçevîça çivîkan.  
 Av, xuşexuşa avan.  
 Paqijî, zelalî, nermî û geşiya destê sibehan.  
 Seg, tajî, nobedarên bêhejmar ên gund û gundiyan.  
 Pisîng, ker, dahşik, hesp, mehîn, cahnî, mîh, bizin, berx, kahr.  
 Dîk, mirîşk, wefadarên qedîm ên gund û gundiyan.  
 Bi tenê tevgera geş a heyata gund û daxwazên heyatê.  
 Bi tenê heyata sade û xwestekên basid ên vê heyatê.  
 Lê deng, dengên nexweş, bisaw.  
 Pêşî seg, bi hewtehwet, bi kûzîn.  
 Paşê teyr û çivîk, bi çîqeçîk, bi qîjîn.  
 Paşê ker, hesp, mehîn, bi hîrehîr, bi revîn.  
 Paşê însan, bi qîreqîr, bi tirsîn.  
 Paşê dayik, bi nalenal, bi axîn.  
 Paşê zarok, bi welewel, bi girîn.  
 Lê deng, dengên nexweş, bisaw.  
 Dengên dûr, mîna dengê zelzeleyekê,

48

Dengên sim û lingên hespan, mîna dengê berfendeyekê.

Dengên siwaran, mîna dengê birûskekê.

Û paşê dengê şûrbazan, mîna dengê qiyametê:

Allah, Allah, Allah...

Allah, Allah, Allah...

Dengê bav û kalan, belê, min gewriya xwe bi avê şil kir û bîhna xwe  
ve-

da, em gotina xwe bidomînin... dengê bav û kalan ko hingê bi tenê  
mî-

na dengê lawaz ê çîrokekê digihîste me û dibû şîrîkê dengê me  
zarokên

li kitabxanê, – ko hê bêhay ji qiyametên rojên bê û bêguman bûn.

Cizîra

wê rojê, Cizîra zarok û xortan, Cizîra hêvî û heyecanê bû, ne mîna  
Cizîra

îro ya mirî û xewn û xeyalên şikestî. Şer hê nîn bû, xwîn nerijabû,  
mir-

inê mohra xwe li eniya însanê botî nexistibû û heyatê terkî me  
nekiribû.

Ji berevajiyê, hêvî û heyatê, mîna dengê dengbêjekî xurt ko olan  
dide, bi

sê dangan, bang li me fikir; gelî botiyan werin dengê me, werin  
dengê

heyatê.

Hingê bihar û tav bû, şinahî û çîçek bû, newroz û cejn bû, Mîr û hêvî  
bû. Hingê, wê rojê tarîti diçû ronahî dihat, serma diçû germahî  
dihat.

Dewleta osmanî nexweş bû û derb li ser derbê dixwar. Gelên  
bindest ên

osmanî kêfxweş bûn û serhildan li ser serhildanê danîn pê. Kurdên  
ko di

nav mîrekiyên bêhejmar de belav bûbûn, vê yeka hanê, ji bo miyegeriya  
xwe, îmkaneke zahf baş didîtin. Û wê roja Newrozê, Mîr Salih ko însanekî zahf dîndar û kekê Mîr bû, dev ji mîrîtiyê berdida û birayê wî yê  
kiçik Bedir Xan dibû mîr. Me nizanîbû ka Salih Beg çima dev ji mîrîtiyê,  
mal û milkên dinyayê, şan û şohreta hukimdariyê berdida. Lê li gora goti-  
nan, wî dev ji her tiştî, heta ji jin û cariyên jî berdida û dibû mirîdekî dîn  
û terîqetê, nimêj û niyazê.  
Ji Cizîra Botanê re mirekî jîr, xurt, serwext û bîrbir diviya, ko bikaribiya  
hukimdariyeke tekûz bianiya pê û eşîr, binemal û deverên perege de li  
hev girêbida, wan têxista qalibekê, mîrekî welê ko xelkê hem jê hez biki-  
ra hem jê bitirsîya, hem hêvî bida xelkê hem xirecirên xelkê ko hîç xelas  
nedibûn, haş bikira, hem xelkê bi serê wî sond bixwara hem zarokên xwe  
bi tirsî wî bikira xew, hem stran û destanan ji bo wî lêkîra hem bi fer-  
maneke wî biçûya mirinê, hem bi edaleta wî aşî bianiya hem bi şûrê wî  
aşî têk bida. Ji Bedir Xanê xort û xurt ko min di hin stranên xwe de mî-  
na »Mîrê Zirav« bi nav kiribû, pê ve, kî dikarîbû bi van karan rabûya?  
Li dinyayê çu tişt ji bextiyariya destpêka rojeke ronî ya cejnan çêtir nîn  
49

e, heke hêvî li ber deriyan, hest jî li ser dilan be... Mam Sefo, Migo, Heme  
û ez, tevî çar pasevanên Mam ko bi şûr û xencer bûn, ji hewşa fireh a malê  
ko bi gul û kulîlkan reng dida, bihurîn û ketin nav şênîyên bajarê Cizîrê.  
Mam Sefo ko hertim bi şal û şepikên xwe yê hewrêşimî, li ser piştê hes-  
pê xwe yê belek î kihêl ê erebî bû, îcar, di nav cilên frengî de, mîna alîmekî  
frengî cîdî û jixwerazî, dixwest bi peyatî here qesra Mîr da ko li rê, cejna  
ehlê Cizîrê jî pîroz bike. Tevî ko Cizîr bajarekî kevnar ê hemû Mezopotamyayê bû û ji demên Nebî Nuh mabû, wê rojê bajêr mîna bûkeke nûgihîştî û nazenîn xwe xemilandibû; xelk bi cil û bergên xwe  
yên paqij û rengîn li kuçan, dar û ber bi cil û bergên xwe yê rengîn li qi-  
raxên çêr, minareyên spî yê mizgeftan û bircên dêr û qesran bi rengên  
xwe yê spî û reş, ber bi asimanan bûn. Piraniya dîwarên xan û xaniyên  
bajêr ên tarîxî ko bi çelpeka spî nû hatibûn sîwaxkirin, şewq didan. Asiman zelal, xanî û kolan paqij, însan rûgeş û hêviya rojê bê li dar bûn.  
Madem qal hat ser asimanê, divê ez bibêjim ko asiman û hawîrdor wê  
rojê mîna rêzên qewlê yêzidiyan bûn; dûre ji renga xemilî. Sor bû, spî  
bû, sefirî. Sor bû, spî bû, geş bû. Ji minareyan dengê azanê, ji bircên dêran dengê zingilê, ji kuçe û kolan dengê def û zirnê, ji medrese û

dîwanxaneyên terîqetan dengê tekbîr û erbanê, ji xanan dengê têkel ê

kerwanan, ji hewşên malan dengê tilîliya jinan û qîreqîra zarokan di-

hat. Herkesî, bi rûyekî ken û geş, hevûdu pîroz dikir, mezin diçûn rûyê

hev, zarok diçûn destê mezinan, kal û pîr diçûn eniya zarokan. Herçî dildarên ko nû bi taya evînê ketibûn, diyar e, nikaribûn herin rûyê hev,

lê wan jî, di wê roja Newrozê de ko herweha roja evîndaran bû, ji ber

derî û penceran, eywan û hewşan, bi livîna lêvan, kenê rûyan, nêrîna

çavan û xeyalên bi heyecan, hevûdu hembêz dikirin. Dua dihatin xwendin, xaç derdiketin, stran dihatin gotin. Şêniyekî boş ê bêpayan

ko Cizîrê çu carê nedîtibû, mîna pêlên Dîcleyê ko di biharan de dibû lehî, bi ser bajêr de hatibû. Ehlê welatê Hekar, Behdînan, Amediye, Soran, Baban, Urmiye, Şikak, Diyarbekir, Siwêrek, Riha, Semsat, Dêrsim, Bêdlîs, Mikus, Wan, Serhet, Mêrdîn, Tor, Çiyayê Kurmênc, Antaqiya û gelekên din, bi hênceta pîrozbahiya Mîr, hatibûn Cizîrê. Bajar qulipîbû ser bajarê ko Seydayê Xanî, şaîrê bajarê Cizîrê û welatê

Botan, di beytên xwe de çêl lê dikir;

Roja ko dibûye îd û newroz,

Tazîmê ji bo dema dilefiroz,

50

Sehra û çîmen dikirine mesken,

Beyda û dîmen dikirine gulşen.

Gava em ji malê hinekî bi dûr ketin, Apê Xelef jî, bi gavên kulek û bi bîh-

neke giran a ka û zibilê, xwe gîhande me. Rûyê wî ko bi xêzikên heyatê

qermiçî bû û bûbû mîna axa nûcotkirî, dikeniya.  
 Min pez şand çêrê, wî got û serê xwe bilind kir da ko here rûyê Mam Sefo.  
 Mam Sefo ko jê gelekî dirêjtir û girstir bû, xwe xwar kir, çû rûyê wî, ce-  
 jna wî pîroz kir û gotê;  
 Eger te dil hebe, bi me re were. Yan na, here malê, xwe bişo, bixwe, vexwe û paşê were qesra Mîr.  
 No, ez jî tîm, wî got û xwe da bin çengê Mam Sefo û meşiya.  
 Gava em, Mam Sefo û Apê Xelef li pêş, Migo, Heme û ez li paş, pasevan jî li herdu milên me, di nav girseya şêniyan de, bi zehmetî, bi ramûsan û bi gotinên pîrozbahiyê, gav bi gav ber bi çêm dimeşyan, cil û bergên fireh ên Migo li min, şekir di devê min de, destekî min di bêrîka min de li ser şekirên şêrîn, destê din jî geh li ser çavê min ê sax, geh di nav difnên min de, bala min li Migoyê stûr û Hemeyê zirav ko min xwe hinekî jê, jiber bîhna fis û tiran, bi dûr xistibû, hingê, ez nizanim çima, lê hingê çavê min ê kor êşiya û min tiştêkî, bi xurtî, hîs kir; ew meşa me ko ber bi Mîr diçû, dê, tevî Mîr, heta mirinê bidomiya. Meş ê li qesra Mîr xelas nebûya, ji wir jî, wê dê li ser rê û xaçeriyên fetloke yên heyatê ko ti- jî sir bûn, ber bi qesr û qonaxên din ên heyatê biçûya, heta mirinê. Piştî ko me çend kolan û meydanên bajêr ko bi kevirên reş ên biçûk lêbûbûn, li pey xwe hîştin û em gihîştin ser riya fireh ko mîna milekî çêm bû û dirêjî çêm, ber bi qesrê diçû, hingê min çem bi hemû bedewiya wî

dît. Çem, bi rengê asimanê, çîkî şîn, bi nazenîn, bi aramî, diherikî.

Darên

kevnare yên çinaran ko bi keskekî tarî xwe xemilandibûn û riya fireh ko

riya sereke ya kêleka çêm bû û hemû riyên bajêr, bivê nevê, xwe digîhandinê, dirêjî çêm, mîna şîrîkên heyata çêm, diherikîn. Hingê hîseke nû ko bi hîsa min a din nedişîbiya, ko di esasê xwe de pirsîyarek bû

û di tahma şekirên Mam Sefo û Senemxanê de bû, ruhê min vegir.

Ev

çemê ko hertim, bêdeng, tevî heyata me dibû, bêdeng şahidî li serpêhatiyên me fikir, çi difikirî? Wî li me çawan dinihêrî? Heke ew jî mî-

na me benî ademan bikaribûya bipeyiviya, wî dê çi bigota? Dengê wî dê

çawan derketa?..

51

Çilka kela strana Dîcleyê, afirîna destana Dîcleyê hingê kete dilê min.

Bi dû re, gava ez bûm însanekî têgihîştî û dengbêj, min bîr bi hîsa xwe ya

wê rojê bir; min diviya strana çemê Dîcleyê li hev bianiya û mîna çêm,

bêwest, bêrawest, bédawîn, her bigota.

Dengê strana Dîcleyê, ko hemû umrê min pê re çû, herwekî çêm, geh geş

e, geh zîz, geh şên e, geh keserkûr, geh tahl e, geh lezîz. Ew geh bi awazeke

bilind e, mîna stranê, geh bi dengêkî nizm e, mîna şîrê. Weha;

Dîcle me ez,

Dengê Dîcleyê,

Nêrîna tarîxê, dilê însaniyetê,

Destpêk im ez, zayin, hebûn.



Çemê cenetê, destebirayê Aras, Zap û Firatê,  
Tewrat, Încîl, Quran,  
Adem im ez, Birahîm, Nûh.  
Tofan, Cûdî, Herekol.  
Kevokeke spî, pelekî hêşîn a dara zeytûnê, vejîn, vejîna heyatê.  
Wext, do, îro, sibê. Wext diherike, diçe, tê.  
Xem, xewn, xeyal. Sûretên wextê, heyam, dewr û dewranê.  
Kesk, şîn, zer. Sor, rengê xwînê. Rengê wextê, do, îro.  
Xurt nerm, zîz şên, bilind nizm. Deng im ez, dengê bayê,  
Berf û baranê, ax û brûskê.  
Bi stêrên zêrîn ên xuricî dikevim xewê,  
Bi tîrêjên zêrîn ên tavê hişyar dibim.  
Şîn im, mîna asimanê, bîhnfireh, bihîstiyar.  
Kesk im, mîna biharê, evîndar, hêvîdar.  
Boz im, mîna kevirê, xemgir, stûxwar.  
Sor im, mîna axê, şikestî, birîndar.  
Keser im ez, mirin, li eniya însanên botî nivisî.  
Bextiyarî me ez, heyat, li axa Mezopotamyayê zayî.  
Xizîn im ez, hesret, li pey malwêran û derketiyan hîştî.  
Evîn im ez, hez, li pey salan, esran, însan û medeniyetan mayî.  
52  
Keştî me ez, kelek, ya Nûh, ya Keso.  
Selahedîn, Ezîzan, Mîro. Ji Cûdiyê ber bi Nînovayê, Babîlê,  
Basrayê.  
Welat bi welat, gel bi gel, ziman bi ziman. Heyam bi heyam.  
Esker, şûr, tîr, mirtal.  
Hesp, dewar, pez.  
Titûn, zeytûn, hevrêşim.  
Însan, însan, însan.  
Şer, pevçûn, şewat, hilweşîn.  
Sil, sext, şaş, mat, dudil, ketî, windabûyî, mirî.  
Dicle me ez, zimanê bêzimanan, dengê bédengan.

Dengê însanan, ruhê wan e, ji dengê wan hûn dikarin nexşeya ruhê wan,  
daxwaza dilê wan keşf bikin û bîr bi fikir û gumanên wan bibin. Lê belê  
wê roja Newroz û pîrozbahiyê ev yeka hanê ne mimkun bû, ji ber ko  
deng bêpayan, însan bêhejmar, tevger bêrawest bû. Ji her derî dengên  
têkel bilind dibû. Li her kuçe, kolan û meydanê govend hatibûn girêdan,  
dîlan li dar bûn, bilûrvan û tembûrvanan lêdixistin, keç û xortên xama  
dilîstin.  
Gava me xwe gîhand kelehê û qesra Mîr, êdî tav ko bi şewq û germahiya xwe beşdarî cejnê dibû, gihîştibû nîvroyan. Gelek pasevan û  
nobedarên çekdar li ber dîwar û deriyê kelehê û qesra Mîr ko ji du milên  
hesînî yên girs hatibûn pê û heta dawiyê vekirî bûn, rêz bûbûn û mê-  
vanên ko dihatin, yek bi yek, derbasî hundir, aliyê bexçeyê kelehê dikirin.  
Bexçe bêpayan mezin, tijî dar û ber, gul û kulîlk bû. Ne bi tenê kitabxana  
Mam Sefo, herweha bexçe û qesra Mîr jî, min, wê rojê, cara yekemîn,  
didît. Bêguman ez zahf caran ji ber derî û dîwarên kelehê ko tevî sûr û  
bircên xwe keleheke qehîm bû, bihurîbûm û min meraq li heyata milê  
din ê dîwaran kiribû, lê niha, bi saya Mam Sefo, derî li ber min vedibûn

û ez diketim hundir. Bexçe bi gelek riyên biçûk ên xîçik hatibû birîn  
û di

her birekî de dar, ber û kulîlkên cihê, mîna nêrgiz, binevş, sosin û  
lalezarên bişkovî hebûn. Li herdu milên riya mezin ko digihîşte  
qesrê,

nobedar rêz bûbûn. Bexçe jî mîna rê û meydanên bajêr, tijî şênî bû,  
heye

ko bi hezaran însan, kom bi kom, çavê wan li govendkêşên zirav ko  
mî-

na marekî xwe dilivandin û guhê wan li dengê saz, def, zirne û  
erbanên

ko awazên têkêl ên hemû mîrekiyên kurdan guheztibûn bexçeyê  
Mîr, li

53

ser gihayên hêşîn ên bexçê rûniştibûn. Sîniyên fireh ên riz, savar û  
goşt ko

jê bîhn û dûmaneke lezîz difûriya, li ber wan bûn. Bi cil û bergên  
xwe yên

têkel û rengîn, wan têkelî û rengîniya welatê kurdan jî nîşan didan.  
Qesra Mîr, ez dikarim bibêjim, avahiya herî mezin bû ko min di  
heya-

ta xwe ya peregende de dîtiye. Bêguman heke însan saraya sultanê  
os-

manî, navenda gumreh a heyata me ya welatê xerîbiyê, ko riya  
heyata

min, Mîr, Têlî û gelek kesên din ji Cizîra Botan, ber bi girava Girîtê  
zivi-

rand, nehesibîne. Qesir, bi dîwan, meclîs, mêvanxane, kitabxane,  
dersx-

ane, mizgeft, şaneşîn, aşxane, mitbax, hemam, xan, jûrên seyd û  
nêçîrê,

cilşuştin û nanopêjiyê, mezelên keç û jinan, zarok û qewraşan, xulam  
û

cariyân ên bêhejmar, avahiya herî navdar a hemû welatê kurdan  
 bû. Li  
 gora gotinan tê de bi qasî 360 mezel hebûn, – ji bilî mizgeft, zîndan  
 û  
 xana ko li ber devê çêr bû. Herçend saraya sultanê osmanî  
 navenda  
 hemû şixul û karên dewleta osmanî bû, qesra Mîr jî ewçend  
 navenda  
 hemû pêwendî û şixulên mîrekiyên kurdan bû. Li ser qesrê gelek şîr  
 hat-  
 ibûn nivîsîn, gelek stran, çîrok, rîwayet hatibûn lêkirin. Milê herî  
 navdar  
 ê qesrê, bêguman, Birca Belek bû ko bi rêzên şairên navdar bûbû  
 remza  
 mîrekiya Cizîra Botanê. Birca Belek ko mîna bircekê ko bi teyrê êlo  
 dişibiya, li ser ava çêr û bi kevirên şehkirî yê reş û spî hatibû lêkirin  
 û ji  
 lewre jê re »Birca Belek« di hate gotin, dîwanxana Mîr bû. Her celeb  
 şix-  
 ulên Mîr û mîrekiyê ji wir di hate gerandin. Her celeb mêvan, paşa,  
 wezîr,  
 mîr, sefîr, alîm, şair, seyda, keşe, patrîk, heham, qasid li wir di hatin  
 qebûl  
 kirin. Civat û civîn li wir di hatine gerandin, soz û biryar li wir di hatine  
 girtin, derengê şevan, gava gerandina şixulên resmî yê mîrekiyê  
 kuta  
 dibûn, bi deng û awaza dengbêjan, şevbuhêrk li wir li dar diketin,  
 qeşmer  
 û berdevk li wir hunerên xwe pêşkeş dikirin, şairan şîrên xwe ko  
 hemû  
 pesn bûn, waqanûseran nivîstên xwe ko hemû methiye bûn, li wir  
 dixwendin.  
 Berî ko em di deriyên qesrê re bibihurin, li ber deriyên mezin, li nik

Mam Sefo, ko bi kêfxweşî simbêlên xwe ba dida û Apê Xelef ko bi kêfxweşî gunikên xwe difirkandin û bi pitepit ji Mam re tiştin digotin,  
min serê xwe hilda û bi dîqet, bi qasî kêliyêkê, li keleh, sûr û bircên wê, li  
qesra fireh û bilind û li Birca Belek nihêrî. Herçiqas ez ne sihêrbaz û remildar bim jî, mîna niha tê bîra min, wê gavê, li wir, çavê min ê kor  
dîsan êşiya û dengê dilê min, bi liyan, gote min ko qonaxa Mîr ê wê rojê  
bibûya qonaxeke nû ya heyata min û min ê pê qonaxeke nû ya heyata  
xwe bibiriya.

54

Çaxê em ketin hundir, ne xulam û xizmetkar, lê bilûrvanên ko ji şal û  
şapikên wan diyar bû ko her yek ji deverekî mîrekiyê bûn, rê pêşkeşî me  
kirin. Hejmara wan niha nayê bîra min, lê gelek bilûrvan, ez bibêjim pêncî, hûn bibêjin sed, di nav şal û şapikên rîsandî û neqîşkirî yê rengîn  
de, bilûrên wan ên reş, spî, sor, qehweyî, zirav, kurt, dirêj, şeş, heyşt,  
donzdeh xelekî, li ser lêvên wan, li pey hev rêz bûbûn û bi awaza bilûrê ya  
bi aheng ko hemû dangan li hev dianî û diyar bû, bi pesn, çêla Mîr dikir,  
riya dîwanxanê ko bi mermerên gewr ên ferîşî raxistîbû û bi pencereyên  
fireh ên qesrê ronî dibû, şanî mêvanan dikirin. Apê Xelef ko bi pitepiteke  
bêmane Mam Sefo bêzar kiribû, dev ji gotinên xwe yê tewş berda,  
li min

zivirî û bi hêdîka, bi ahenga dengê bilûrê, dest bi stranekê kir û  
hênijî;  
Mîro, mîrê mino,  
Bejnziravo, aqiltemamo,  
Çelengo, rûgeşo,  
Li roja xweş hukimdaro...  
Herçiqaqas min strana Apê Xelef çu carê nebihîstibû û welê dixuya ko  
wî,  
dîsan, mîna her carê, gotin, li gora mercên ko em tê de bûn, li hev  
anîbûn, min jî, bêgav, gotinên wî dubare kirin. Bi dengê bilûrê û  
pisepisa  
»mîr û mîro« em gihîştin dîwanxana Mîr. Li ber derî em sekinîn.  
Deriyên  
dîwanxanê ko bi zîvê gewher neqîşkirî bûn û li serê jî sûretê şêrekî  
di nav  
kevirekî reş de hatibû kolandin, vekirî bûn û dîwanxana ronî ko bi  
tîrêjên  
tavê û leylana ava çem aliyekî wî şewq dida, tijî şênî bû. Li hember  
derî,  
li milê din ê dîwanxanê ko ji me bi qasî sed gavan dûr bû, Mîr li ser  
dîwaneke rengîn, ji şênîyên der û dor hinekî bilindtir, rûniştibû.  
Gotina  
mîr ko însanekî bi rîh û simbêl, mêrekî bi kêmanî navsal an kal dianî  
bîra  
însanan, li wir, bi bal û endama xortekî şox û şeng, bi şal û şapikên  
ge-  
wher, bi simbêlên zirav û rûyekî delal û geş, rûniştibû. Mîrê me li  
wir, di  
nav girseya kalemêran de mîna şitileke rihanê zirav, delal, aram,  
maxrûr  
li mêvanan dinihêrî.  
Mamo, mîrê me gelekî xort e, min, bi heyret, ji Mam Sefo re got.

Herê xort e, lê jîr û zana ye, serwext û hişyar e, wî destê xwe bire  
ser serê  
min û got.

Rûyê Mîr biken bû, ji rûniştin, nêrîn û tevgerên wî yên giran dixuya  
ko

Mîr, tevî umrê xwe, ehlê şixulê mîran, zana û kumandaran bû. Di rû  
û

awirê wî de tarîxa me ya nû ko qonaxa nû ya heyata min bû jî,  
dixuya;

55

yekîtî, pêşketin, sermaye, aştî, edalet, xurtî, xweserîtî û mîna  
netîceyeke

van tiştan hemûyan dijîtî, nemaze dijîtiya bi osmaniyan re ko çu  
carê li

ser axa kurdan mîrekî xurt nedixwestin. Ê dawiya dijîtiya bi  
osmaniyan

re, mîna her carê, diyar bû; şer, xwîn, jan û keser...

Hemû giregirên welatê osmanî û kurdan li dîwanxana Mir bûn. Apê  
Xelef ew yek bi yek, bi tiliya xwe ya qermiçî û bi rengê titûnê  
zerbûyî,

nîşanî me zarokan da; mîrên Hekar, Behdînan, Baban, Bedlîs û  
Mukisê

bi şal û şapikên welatên xwe; paşayên osmanî yên bajarên  
Diyarbekir,

Bexda, Mûsil û Wanê û çend zabîtên mezin bi kincên xwe yên resmî,  
fes-

ên xwe yên sor û bi simbêl û rîhên xwe yên palik; çend sefirên  
welatên

frengî bi cil û bergên frengî ko bi cil û bergên Mam Sefo dişibîyan;  
patrîk

û keşeyên civatên ermen, suryan, keldan, nastûr, yaqûbî bi cil, berg  
û

kumên xwe yên reş ên dînî; sê serekên ruhanî yên civata cihuyan bi

kumên xwe yên biçûk ên reş û bi rîhên xwe yên gelekî dirêj; şêxên  
êzidiyan bi libasên xwe yên spî û por, rîh û simbêlên xwe yên dirêj  
ên  
nûranî; şêxên ereban bi galabî û egalên xwe yên rengîn; şêxên  
terîqetên îs-  
lamî û seydayên medrese û mizgeftan, bi rîhên xwe yên reş ên  
henekirî;  
axa, beg, malmezin û serekên eşîrên kurdan bi şal û şapikên xwe  
yên  
xusûsî yên rojên weha û gelek kesên din ko bi gotina Apê Xelef  
»tirtire« û  
di esasê xwe de, ji bav û kalan, dijminê hevûdu bûn û heke fersend  
bidîti-  
na, wan ê gora hev bikola, li wir, mîna perwanên ko li dora find û  
qendîlê  
diferîn, li der û dora Mîr bûn.  
Belê Mîr, mîna qendîla şeva me, qendîleke ronî bû. Şevbuhêrk bi  
qendîleke ronî, tarîx bi zîlamên ko mîna qendîlê ronî ne, li dar  
dikeve.  
Civat şên e, de em herin hundir, kuncikê yadîgar û bexşîşan, Apê  
Xelef  
got û daf da me ko em bikevin hundir.  
Kuncê ko Apê Xelef nîşan dida, bi rengên têkel diçirûsî; her celeb  
zêr û  
zînet, lûlû û gerdeniyên mirarkirî, şûr û xencerên kalanzêr û  
qewdmirarî,  
tingên helqedar, nêrgizî û berwec ên zîvhêlî, caw û qedîfeyên  
hevrêşimî  
yên giranbiha, mehfûr û xaliçeyên hevrêşimî yên hemû welatên  
rojhatê,  
li wir, bi dûzaneke têkûz, li nik hev, rêz bûbûn. Diyar bû, her mêvanê  
ko



hatibû, bi hênceta pîrozbahiyê, tiştine spehî û giranbiha yên welatê  
xwe

jî, mîna diyarî, ji bo Mîr anîbû.

Lê Mam Sefo bi milê Apê Xelef ko hê jî çavê wî li ser çirûskên zêr û  
zînetan bû, girt, no Xelef, got, civateke din a şên li milê din heye, tu  
zaruwan hilde û here wir.

Mam Sefo em, tevî Apê Xelef û du pasevanan, şandin cîhekî din,  
56

meclîsa dengbêj, çîrokbêj, stranvan û bilûrvanan ko li milê din ê  
qesrê, ji

dîwanxana Mîr gelekî bi dûr bû. Meclîsa dengbêjan ko bi eslê xwe  
mê-

vanxane bû û ji bo wê rojê bûbû cîhê dengbêjan, ne bi qasî Birca  
Belek

bûya jî, ne kêrî wê mezin bû. Civat geriyabû, dengbêjên herêmên  
cîhê

yên binav û bênav, sazbandên hoste, bilûrvanên ko her texlîd deng  
ji

bilûra darîn derdixistin, tembûrvanên ko ji her têleke tenbûrê  
donzde

deng derdixistin, musîkejen, zurnejen û deflêderên bijarte yên  
welêt ko

hosteyên hunera lêxistina haletên têkel ên musîkê bûn, gelek şagirt  
û

berdevk ko nû digihîştin, hemû li ser doşegan rûniştibûn û haziriya  
danê

êvarê dikirin. Piştî merasîma mîrîtiyê, dengbêjên mîr û began ê  
derketi-

na hizûra dîwanxanê û bigotana. Wan ê di roja tarîxî de hemû  
hunera

xwe pêşkeşî şêniyê bijarte bikirana û nîşan bidana ko ew dengbêj û  
hunermendên yekta bûn. Bi dû re jî wan ê li bajarê Cizîrê û deverên  
din

ên mîrekiyê, heft roj û heft şevan ko pîrozbahî dê bidomiya, her û  
her lêx-  
istana û bigotana.  
Paşê, piştî tecrubeyên kirêt ên salan ko tijî keser, hesret û jan bûn,  
ez  
têgihîştim ko ew meclîsa hanê ko wê rojê, ji bo min, bi tenê  
şênahiyeke  
germ a rojane bû, di esasê xwe de, dengê têvel ê tarîxê bû. Derbên  
heyatê  
hînî min kir ko qayida çerxa felekê weha bû; her rûpeleke nû ya  
tarîxê bi  
dengan vedibû, carina bi dengê şûr û tivingan, carina bi dengê  
qelemşor  
û dengbêjan, carina jî bi hemû dangan ko hungiva tîr û xwîna ron  
tevî  
hev dikirin.  
Çaxê Apê Xelef ko li ser gotina Mam Sefo xwe negîhandibû bexşîşan  
û  
hinekî eciz bûbû, dengbêj û bilûrvan dîtin, kêfa wî hate şûnê, tavilê,  
em  
li ber derî hiştin û tevî kulekiya xwe, bazda, çû koşeyekî meclisê.  
Hunermend kom bi kom rûniştibûn, siniyên fêkî û xwarinan li ber  
wan,  
lêdixistin û digotin. Her yekî li gora meqam û qalibên deverên xwe,  
li go-  
ra awaz û ûsluba xwe, hunereke xas li dar dixist. Awaza dengbêjên  
çiyayên Hekarê tevî awaza dengbêjên beriya Mêrdînê, ûsluba  
gotina  
nastûran ko gelekî bi duayên Îsa Mesîh dişibiyan, tevî ûsluba  
telqînên  
êzidiyan, meqamên neqşîbendî û qedirî yên îslamî tevî meqamên  
ermen,  
keldan û cihuyan dibûn. Sed deng û sed awaz li bin guhê hev diketin.

Bavo em dîsan terk kirin, Heme, rûtirş, got, ew hertim welê dike.  
Apo dîsan da pey dengên nas, min lê vegerand, da ko rê li teşqeleyekê  
bigirim, Apo hertim dide pey dengan. De em jî herin nik wî.  
Bêyî ko kesek bang me bike yan cîhekî nîşanî me bide, em hersê çûn  
koşê, li nik Apê Xelef rûniştin. Haya kesî ji me nebû, herkes bi şixulê  
xwe

57

ve mijûl bû. Koma ko em li kêlekê rûniştibûn, dostên Apê Xelef û ji  
de-  
verên çiyayê Şingalê bûn. Wan stranên gelekî kevn, geh li ber hev,  
geh bi  
dor, digotin. Stranên wan bêtir pesn bûn, pesnên mîr û şêxan, axa  
û be-  
gan, dîn û îbadetê, tebiyet û dinyayê. Mîna ko ew ji xwe ve çûbin,  
welê ji  
her tiştî dûrketî, destekî wan li ber pelê guhê wan, piraniya caran  
çavê  
wan girtî, wan her digotin. Wext ne xema wan bû, gava ew  
radiwestiyan,  
wan bîhna xwe vedida, fêkiyekî dixwarin, fireke av vedixwarin da ko  
ji nû  
ve dest pê bikin.  
Min du sêv, sê hurmî û portaqalek xwarin. Lingên min ko di bin min  
de bûn, tevizîn. Tevî ko pencereyên meclîsê vekirîbûn, bîhneke  
giran a  
cixare, qelûn, xwîdan û bêguman ya tir û fisên fistûjê me, bi ser  
meclîsê  
de girtibû. Bîhna min çikiya. Ez, bi qewlê Armê, Biroyê henekçî ko  
her-  
tim li pey henek û lîstikan bûm, hînê rûniştina vê celebê nebûbûm.  
Bi

min êdî welê hat ko dengên ko di destpêkê de ewçend ji hevûdu  
cihê,  
xweş û balkêş bûn, qulipîn ser dengekî, bi tenê dengekî; dengê nas  
ê pes-  
nan. Çavê min li wan, min hinekî mewîj, hêjîrên hişk, tevî kakilên  
gûzan,  
xwarin û bi qasî cêrekî jî av vexwar. Wan digot, lê ne bi dengê dil,  
ne bi  
hostehiya afirînê, ji bervajiyê, bi dengê qalibên kevn ko bêyî ked û  
xîreteke hêja, li pey hev rêz dibûn...  
Ji navberê çiqas wext bihurî, ez pê nizanim, lê çaxê tîrêjên tavê êdî  
ji  
meclîsê bi dûr ketibûn û xwe gîhandibûn ser banê qesrê, ji eciziyê,  
ji niş-  
ka ve, piştî ko dengbêjekî kal ê rîspî ko diran di dev de nemabû û  
gotina  
wî baş fahm nedibû, rawestiya, min jî dengê xwe yê zirav û zelal  
bilind  
kir. Di nav wan dengên qert de, dengê min mîna dengê çivîkekê  
derket,  
lê dengê çivîkekê ko hê nû, bi heyecan, çavê xwe li dinyê vedikir û  
hêdî  
hêdî bi firê diket. Dengê min jî dengê pesnê bû, lê ne mîna dengên  
din,  
dengê min çêla axa û began, mîr û şêxan nedikir, wî çêl li çemê  
Dîcleyê  
dikir;  
Ez Dîcle me, Dîcleya lehî.  
Ne qam e, ne bihur, ne jî delav... hertim zindî.  
Dengbêjên xwedantecrube ko qedirgirên şagirtan bûn, ji ber bextê  
min ê  
çê, dengê min nebirîn. Gava kesî dengê min nebirî, êdî rê li ber min  
ve-

bû, min ê heyfa xwe hilaniya û mîna wan, heft roj û heft şev, her û her

bigota! Lê îcar, ji ber bextê min ê neçê, hingê tişteki qewimî ko heyata

min xist ser riyeke din. Piştî min ber bi derî bû, min hay jê nîn bû ka li

58

wî milî çî dibû. Bêyî ko ez zêde lê bifikirim, min gotin li hev siwar dikirin

û strana ko bi çu stranê nedişibiya, dirêj dikir. Lê ji nişka ve ji bilî dengê

min, hemû deng hatin birîn û bêdengiyekê bi ser meclîsê de girt. Ez bêtir

kêfxweş bûm û min bêtir zor da dengê xwe yê çîveçîv î reben. Ji bilî min,

hema çî bigire hemû şênîyên meclîsê rabûbûn ser piya jî. Meclîsê, deng-

bêj, tembûrvan û bilûrvanan dengê xwe birîbûn û rabûbûn ser piyan da

ko li dengê min guhdarî bikin û qedrê hunermendiya min bigirin! Lê ga-

va Apê Xelef, bi zixtan, çêrî min kir, min rastî fahm kir;

Kero, dengê xwe bibire, gêjo, gêjo... tiredîno!..

Çaxê min dengê xwe birî û xwe zivirand, min rastî dît; Mîr, tevî Mam Sefo û çend kesên din ên girs ên simbêl û rîhpalik, li pey min, li pê rawestiyabûn. Çima ew hatibûn meclîsê, ez pê nizanim, lê ew li wir bûn!

Ez veciniqîm û bi carekê rabûm ser piyan. Mîrê bejnzirav û umirciwan

ko bi awirê xwe aramiyek, rêz û rêzdariyek direşand doralîyê xwe, dikeniya.

Bêje min xorto, ev strana kê ye, tu dibêjî?

Strana min e, Mîrê min, min, bi şermzarî, gotê.

Naxwe te li hev aniye?

Herê.

Kengî te ev strana delal çêkir?

Niho...

Çaxa min gotê »niho,« ew û kesên pê re kenyan.

Dîcla ko tu çêl lê dikî, kî ye, çi ye?

Ez im...

Tu kî yî? Tu kurê kê yî? Navê te çi ye?

Biro, min gotê û dewsa bersîva pirsê din, min serê xwe xwar kir û li del-

ingên şalên xwe ko ji erdê diçûn, nihêrî.

Piştî ko Mam Sefo di guhê Mîr de tiştin gotin, Mîr destê xwe bir serê min û paşê got;

Aferîn, dengê te zahf xweş e, lê jê re û ji gotinên te re terbiye, ders û

nîzam divê.

Paşê jî ew vegeyriya ser rîhpalikan û gote wan,

Biro bişînin medresê, Medresa Sor. Bala min ê lê be, haya min ê jê hebe, kekê Stephan ê lê xweyîtî bike...

Dengê Mîr xurt bû, tê de germahî û coş, ferman û cîdiyet hebû.

Herçî

gotinên wî bûn, ew toveke teze bûn ko Mîr, ji bo umrê min ê teres, hey-

59

ata min a têkel diçand axa Cizîra Botanê.

Herçî gotinên min û dûmahîka tova ko dihate çandin û riya teze ya umrê min in, hûn ê wan di şevbuhêrka bê de guhdarî bikin. Ez êdî westiyam, şeva Dîcleyê diqulipe û stêrên ko niha diçin ava, Stêra min

tînin bîra min.

De min û Stêra min bi tenê bihêlin.

De qendîle bitefînin û herin...

60

## ŞEVBUHÊRK DUDO

heyv

Dengê min yanî dengê Biroyê dengbêj ko hûn ê îşev jî bibihîzin,  
dengê

xewnên dewr û dewranên bihûrî û xem û xeyalên kevn e.

Dewr û dewranên bihurî, yanî wext, wexta ko li tu kesî, tu tiştî, tu  
zirûfî

guhdarî nake û her tiştî, her kesî, her bûyerê dide ber xwe û hertim  
di-

herike. Heyam tînen û derin, ew diherike; mîr û beg, siltan û paşa tînen  
û de-

rin, ew diherike; felaket, şer, pevçûn, qetliyam, koç tînen û derin, ew  
di-

herike; em, însanên basîd ko ji bo demeke kurt dibin mêvanên vê  
axa ko

pirî caran bi xwîne tê avdan û paşê, pirî caran bêşop dibin binax, tînen  
û de-

rin; ew diherike.

Herwekî çemê me yê Dîcleyê ko bêrawest diherike û hertim, şev û  
roj,

sal û babilîsk, li serencama me însanan şahidî dike.

Her roj lîstika heyatê dubare dibe, heyat ji nû ve hişyar dibe. Di  
berbanga sibehê de tav li pey çiyayê Cûdî, bi tîrêjên xwe yê zêrîn,  
bi sê

dengan, bang li me, însanên ko mêvanên heyatê ne, dike; ez tînen,  
ez tînen,

ez tînen... Bi dû re, di danê sibehê de, ew, mîna kevanekî vekişiyayî,  
li ser

gopikên zincîra çiyayan, bi renekî helesor, bi ronahiyeke bêpayan,  
mîna

keskesorekê, diçirûse. Bi rengên tavê ko rengên heyatê ne jî, heyat  
hişyar

dibe, dar û ber xwe dixemilînin, însan, mîna min ko bi firteke avê û  
bi  
çend lib mewîjan dest bi roja nû dike, mîna we ko bi dengê zar û  
zêçan û  
bi dest û tiliyên nermên jin û keçan hişyar dibin, çemê Dîcleyê  
ronahiya  
tavê hembêz dike û kirasekî ji kirasên xwe yên bêhejmar ko bi rengê  
tavê  
hatiye hûnandin, li xwe dike û axa abadîn bi saya tîrêjên tavê, ji nû  
ve, bi  
bîhnên abadîn ên heyat û dinyayê difûre. Gava danê sibehê diqulipe  
ser  
nîvroyan û tîrêjên tavê di navbera kevanên pira Cizîrê re xwe dirêjî  
avê  
dikin, hingê êdî dinya û heyat di nav ronahiya boş de ye û xwe dişo,  
bi  
gotineke din, xwe ji curim û gunehên xwe paqij dike. Meriv bawer  
e ko  
ew zîndeyî û xurtiya tîrên tavê yên nîvroyan îlelebet e, lê sed  
mixabin, ne  
welê ye, mîna her tiştî, piştî seyrana ronahiyê, tav di ser çiya, çem,  
gelî,  
newal, deşt û beriyan re diqulipe milê din ê asimanan û ji hêz û  
quweta  
61  
xwe dikeve. Danê êvaran, berî ko hingura êvarê dakeve, li milê  
rojaya yê  
çemê Dîcleyê, li pey çiyayên bilind, tîrêjên tavê ko êdî qels û jar in,  
dîsan  
bi renekî helesor xwe dixemilînin û hêdî hêdî winda dibin. Lê berî  
ko  
tav ji me xatir bixwaze û li pey çiyayên winda be, mîna bûkeke nazdar  
ko bi



gavên giran û bi şermokî dikeve mezelê gerdegê, careke dawîn li  
me îñ-  
sanan û dinyayê vedigere û bi sê dangan bang li me dike; ez derim,  
ez de-  
rim, ez derim.  
Tav dere, stêr tên, bêhejmar, bêpayan, boş. Asiman duqilipe ser  
bixêriyekê ko tê de pêtên êgir, bêrawest, diçirûsin. Stêr, mîna  
rêberên  
şevê, rê li ber heyvê, banûya şevan, evîndara keserkûr a royê û  
hukimdara  
reşahiya şevê, vedikin û heyv, bi tevgerên aram, giran, nazenîn tê û  
cîhê  
xwe yê giranbiha di qata asimên de werdigire. Ronahiyeke din ko bi  
ron-  
ahiya tavê naşibe, li hember dinya û heyatê, radibin govendê;  
Komika  
Sêwiyan ko mîna siwarên şevê ji rojhilatê hiltên, Tirmê Mexilan, ev  
heft  
stêrên xweşik ko bi hev re neqşeke zêrîn di sînga asimên de dihûnin,  
Leyl  
û Mecnûn ko hertim yek li rojhilatê, ya din li rojavayê diçirûsin, Çerx  
û  
Felek ko di gewriya asimên de rêzeke gewher tînin pê, Dûpişk ko bi  
dûpişkan dişibe û hertim li rojhilatê ye, Pîr û Mizên ko mîna tavê ji  
ro-  
jhilatê serî hildidin û li rojavayê dihelin, Kerwankuj ko piştî nivê  
şevan  
dixurice û Qurux ko di destê sibehan de li rojhilatê diyar dibe, ev  
stêr  
hemû, ji bervajiyê tavê ko hukimdara tekane ya rojê ye, bi hev re,  
bi  
hevkarîyeke têkûz a qayideyên tebiyetê, serkêşiya govenda şevê  
dikin. Şev

perda xwe ya zêrhêlî ko bi kela heyvê û govenda stêran diçirûse,  
vedigire  
ser dinya û heyatê, hemû west û keft û lefta rojê ji holê radike û  
dinya û  
heyatê dixê nav xeweke şêrîn û wewneke rengîn, da ko di  
berbangeke nû,  
xurt û zînde ya sibehê nû de, dîsan, xatir bixwaze û here. Çaxa  
heyv û  
stêr êdî xatir dixwazin û derin, tav jî, bi tîrêjên xwe yê çîk î zer,  
dîsan, li  
pey çiyayê Cûdî serî hildide û bi sê dangan bang li dinya û heyatê  
dike; ez  
têm, ez têm, ez têm...  
Çerxa dinyayê, herweha bi hatin û çûyina roj û şevê, hefte û mehan,  
sal  
û sedsalan, dizivire, em jî tê de, ez jî tê de. Kurd dibêjin, heta xwe  
nas kir,  
umrê xwe xelas kir. Niha, di xelasiya umrê xwe de, ez hew roj û  
şevan, meh  
û salan dihijmêrim. Êdî ne qaxû, şik, guman û lez û beza rojane, ji  
bo min,  
hene, ne jî xwestek, miraz û xeyalên weha. Mîna berfendeyêke xurt  
ko xwe  
ji sînga çiyayê rizgar kiriye û ber bi geliyên bêbinî gêr dibe, min jî xwe  
ji zîn-  
cirên wextê û nîrên ko wext li stûyê însanan dike, rizgar kiriye û  
mîna  
berfendeyekê ber bi geliyên xewn û xeyalên xwe yê bihurî gêr  
dibim.

62

Herwekî vî çemê Dîcleyê ko niha, çend gav ji me bi dûr diherike; ji  
çerxa wextê rizgar, ji hemû barên wextê azad, ji hemû kesp û  
kospên wex-

tê serbest, lê di eynî wextê de di nav hemû dewr û dewranan de,  
pê re.

Belê mîna Dîcleyê ko di nav pêlên wî de do, bi dengên bihurî, bi  
xuşex-

uş, xwe bi îro; îro, bi dengên têkel ên îro, bi guregur, xwe bi sibehê  
digi-

hîne, hemû dewr û dewran, tevî hemû reng, deng û tahmên xwe,  
bi hev

re, carina tevîhev û serûbin bûyî, carina li kêleka hev û bi dûzan û  
aheng,

diherikin û pergâl û serpêhatiya heyata min, heyata we, heyata ehlê  
der û

dorên çêrî tînin pê.

Êdî ne kêfxweşî, ne keser, ne hêvî, ne jî şikestina xeyalan ji bo min  
maye. Ne mal û milk, ne şan û şohret, ne malbat û zarok, ne hesab  
û

kitab, ne hatin û menfeat... Heta berî niha bi çend mehan, ji hemû  
tiştên

min ên heyatî ko li ser riya heyata min a fetloke yek bi yek winda  
bûn, du

tiştên min mabûn; Stêr û dengê min. Stêr çû, heliya û xuricî. Dengê  
min

jî êdî diçe. Çu tiştê ko êdî min bi vê heyata kambax ve girêbide, nîn  
e û

nema. Tevî ko çerxa wextê li dijî bîranîn, xewn û xeyalan e, niha êdî  
bi

tenê tevgera xewn û xeyalan, herikîna wan a bêrawest heye û  
maye.

Hedefa min, îro, êdî bi tenê ev e; ez bikaribim xwe bigihînim binê  
geliyê

xewn, xeyal û dengên bihurî û wan veguhezim îro, heye ko  
peregende û

tevîhev, bigihînim we, nifşên nû, dengên dewr û dewranên bê. Niha ez,  
bi tenê, ji bo vê yekê, dil dikim ko hinekî din bijîm, bêyî çu mebesteke  
heyata rojane, bêyî çu haletekî însanî mîna hesûdî, zikreşî, kîn û nefretê  
ko însanan dike dîlê xwe, lê belê hê jî bi hez û evîna gotin, vegotin  
û bi-  
hîstinê, bi bihîstina dengên xewn û xeyalên bihurî û bi bîrbirina  
tevger û  
lebatên rojên bê, xetên sereke û kitekitên wan ên xweş-nexweş, çê-  
neçê  
yên rojên bihurî, yên rojên bê, çend roj, çend hefteyên din bijîm, –  
mîna  
çemê Dîcleyê ko her tiştî dibîne, dibihîse û bi dengê xwe yê xas, bi  
xuşî-  
na xwe vedibêje, mîna axa ko carina bi tava germ, diyar, zelal, leylan  
dide,  
carina di nav mij û dûmanê de veşartî, nexuya, carina mîna rengên  
teyrê  
tawis rengîn, bi şox û şeng, carina mîna çîrokên Tewratê xizîn, bi  
keser û  
jan.  
Hema çî bigire her şev, piştî ko wawîk û kundên şevê jî êdî dengê  
xwe  
dibirin, mîna ko hin deng bangî min dikin, ez hişyar dibim. Dinya hê  
tarî ye, stêr neçûne ava, tîrêjên tavê hê bangî dinya û heyatê  
nekirine û  
keleberbanga sibê hê neavêtiye. Bi qasî bîhnekê di nav cîhan de  
rûniştî,  
ez firtek av vedixwim û çend lib jî mewîj davêjim devê xwe. Ji dengê  
çêm

pê ve çu deng nayê bihîstin. Ez xwe didim hev, radibim ser piyan û der-

63

im ber pencerê, da ko li çêm, li hawîrdor binêrim. Ez li dangan digirim,

dengên ko di xewnên min de bûn û ez hişyar kirim, gelo ew li kû ne? Di

nav çêm de? Pê re? Yan jî dengê çêm bi xwe? Çem li wir, ji min bi qasî sed

lingan dûr, li ser rûyê wî çirûskên stêran ko vêdikevin û vedimirin, nazenîn diherike. Piştî ko ez li çêm ko her û her navenda qedera min e,

fedikim, hingê ez têdigihêm ko dengên ko ez hişyar kirime, ne li hawîr-

dor, lê belê li heşê min in. Deng, gotin, kelam, stran, serpêhatî, destan,

rîwayet, hedîs, lawij, dua, çîrok, beyt, rêz, hemû bi hev re, di heşê min de

olan didin da ko riyekê bibînin û xwe ji min rizgar bikin, xwe bi ronahiya

dinyayê bigihînin. Her çawan ko kulîlka berfînê zikê axê, qeşa û berfê

diçîrîne û di seqema zivistanê de serî hildide, her wisan dengên ko di heşê

min de ne, dixwazin serî hildin. Deng bang li min dikan, divê ez xwe bi

wan dangan bigihînim, wan ji binê geliyê kûr ê xewn û xeyalan derbîn-

im, wan li hev bînim û ji wan gotineke nû, serpêhatiyêke nû pêk bînim.

Gotineke nû ko tê de hem rastiyan min û we hene hem jî xewn û xeyalên

min û we.

Xewn û xeyal mîna hespekî rewan e ko dest bi bezê kir, êdî gelekî zehmet e ko meriv bikaribe rê lê bigire. Mîna her hespê çê ko zengûyan nagihîne xwe, hespê xewn û xeyalan jî rê li ber xwe rast dike û bi gotinên têkel, çê-neçê, kirêt-nekirêt, bedew-sivik, bilind-nizm, şêrîn-neşêrîn, xurt-qels dibeze. Rast e, gotina xweş, bihara dilan e, lê her biharê jî zivis-tanekê heye, her biharek li pey zivistanekê ye. Ji lewre hespê xewn û xeyalan bi gotinên xwe carina dilan bi ken û henek dikelînin, carina jî bi keser û jan disotînin, carina deng û gotin dibin hingiv ko meriv jê têr nabe, carina dibin jahr ko meriv jê xelas nabe, carina mîna tîrêjên tavê hêvî û xwestekan hişyar dikin, carina jî mîna stêrên ko dirijin, coş û heye-canê divemirînin. Hespê xewn û xeyalan çav natewîne, her û her, bi sê dangan, bang li siwarê jîr dike. Çavê min ê sax li ser ava zêrîn ê çêm, dil û mêjiyê min ber bi geliyê kûr ê deng, xewn û xeyalan ko di heşê min de veşartî ye, ez xêrhatinî li tîrêjên yekemîn ên tavê dikim û xwe berdidim binê geliyê, dikevim nav dangan, nav xewn û xeyalên bihurî. Li wir ez carina bi tenê me, carina bi dehan, sedan, hezaran dangan re me, carina pêrgî rastiyan tîm, carina derewan, carina dengên heyata min bi ser min de tîm, carina dengên heyatên ko

şîrîkên heyata min bûn, carina şikefteke dengan li ber min dixuye,  
carina  
deryayeke bêdawîn a olan û axînan... Heta ko hespê min ê rewan ji  
bezê  
dikeve, heta ko dinya ronî dibe û deng ronahiya dinyayê dibînin.

64

Fermo, eve jî çîroka min û deng, xewn û xeyalan e.  
We xwest, ez ê jî bibêjim. De tasa min tijî av bikin, qutiya cixarê,  
heste  
û xwelîdankê bînin û deynin kêleka nivînên min, deriyê dilê xwe  
vekin û  
li dengên ko di berbangên sibehên çemê Dîcleyê de li hev hatine,  
guhdarî  
bikin.

Dengê Medresa Sor ji dengên têkel hatibû pê; dengê seydayên  
xwedî îlim  
û îrfan, dengê feqehên ko li ser riya îlim û îrfanê bûn, dengê şagirtên  
ko  
hê haya wan ne ji îlim û îrfanê hebû ne ji çerxa felekê, dengê  
bangvanê  
mizgeftê ko rojê pênc caran hemû taxa Medresê tijî fikir, dengê  
pêşnimêj  
ko bi rêz û rêzdarî, rêberî li ehlê ko dihatin mizgeftê fikir, dengê  
qutabiyên ko diketin hicreyên Medresê û tê de li Xwedayê alemîn  
di-  
fikirîn û dersên xwe jiber dikirin, dengê kahniya hewşa Medresê ko  
her-  
tim bi xuşexuş diherikî, dengê ayet, hedîs û dersên ko ji mezelên  
bêhej-  
mar ên Medresê bilind dibû, dengê xwendina dersan ko ji  
dersxanan  
derdiçû û dengê fatîheyên ko hertim ji gora Melayê Cizîrî vediguhezî  
Medresê...

Di wexta me de, Medresa Sor, yek ji navendên herî girîng ê îlim û îrfanê yê hemû Mezopotamya jorîn bû. Medreseyên kurdan nas in, medreseyên welatê Mikusê, ko ya herî meşhûr medresa Mîr Hesênê Welî ye, medreseyên Westanê, Xeydayê, yên bajarên Çolemêrg, Bazîd, Farqîn, Amed, Çepexçûr, Sêrt, Mûş, Bêdlîs, Norşîn û gelek deverên din, hem bi nav û deng in hem jî warê zanîn û îlim in. Lê belê di nav wan de, bi qasî ko ez dizanim, ya herî navdar û herî girîng Medresa Sor e, ko bi destê mîrên welatê Cizîra Botan ava bûye û hertim bi alîkarî û çavneriya wan heyata xwe dewam kiriye. Ji bilî Medresa Sor hin medreseyên din ên navdar ên Cizîrê mîna Medresa Mîr Evdal û Medresa Sulêymaniyê jî hene. Lê Medresa Sor, bi avahiya xwe ko ji qermîtên sor ên hûnandî av-abûbû, bi tirbeyên xwe yên muhîm ko ji bo hemû welatê kurdan muhîm bûn, bi alîm û seydayên xwe yên bijarte ko li hemû welatên Rojhilat xwedî nav û deng bûn, bi terbiya xwe ya mîna pola ko şev û roj, sal donzdeh meh dewam dikir û perwerdeyiya xwe ya mîna hevrêşim ko ji çend sed salan û bi vir de her û her li dar bû, bi hewşa xwe ya fireh ko her-tim şên û geş bû, bi eywanên xwe yên hûnik ko bi sitûn, kemer û kevanên xwe ko celebeke taybetî ya avahiyê dianin pê, bi kitabxanaya xwe ya dewlemend ko di hemû cîhana îslamiyetê de navdar bû, bi rehle, ref û hi-



creyên xwe yên biçûk ko di zikê dîwaren de vekolandî bûn, bi mizgefta

65

xwe ya neqîşandî ko li ser riya hevrêşim ko ji welatê Romê heta Çîn û

Maçînê diçû, qonaxeke esasî bû, bi nivîşt, hedîs û gotinên bijarte yên rêz-

darên ko li dîwarên Medresê kolayî bûn, bi dîwarên xwe yên çikî sor ko

di berbang û hingoran de bi şewqeke sor dibiriqî, bi gorên Melayê Cizîrî

û malbatên mîrekiyê ko li hemû herêmê ziyaretgehekî nas bû, bi pencereyên xwe yên fireh ên çaxkirî ko tîrêjen tavê tê re dirêjî hundir

dikirin û hertim şewqeke zêrîn direşand hundirê dersxanan, bi mêvanx-

ana xwe ko ji çend mezelan hatibû pê û her şev tê de civata seyda, alîm û

zanayan digeriya, bi mezelen xwe yên bîhnvedan û razanê ko hertim

hûnik û bêdeng bû, bêpayan bû.

Medresa Sor ko bi xwe jî mîna kelehekê bû, ne dûrî keleha Cizîrê û qes-

ra Mîr bû. Hinekî ji çem bi dûr, lê nezîkî Birca Belek, qesra Mir û nêzîkî

mizgefta Silêmaniyê, tirbe û mizgefta Nuh Pêxember bû. Medrese ko

hertim bi şêniyan, bi mêvan, rêwî, şêx, mela, alîm û dengbêjan ve tijî bû,

di nava bajêr de bû. Hertim tê de bi qasî sed, sed û bîst şagirt, bi qasî

panzdeh, bîst feqe û bi qasî deh seyda hebûn. Ew hemû li wir dijiyan,

wan li wir dixwarin, vedixwarin, radizan, dixwendin û terbiye dibûn.  
Medresa Sor ne bi tenê warekî girîng ê îlim û îrfanê bû, herweha  
maleke  
germ a malbata misilmanan bû jî. Xwarin û vexwarin jê kêr nedibû,  
mê-  
vanxane hertim tijî bû. Ê hemû mesrefa Medresê li ser qesra  
mîrekiyê bû.  
Hema çî bigire hemû navdarên edebiyata kevnare ya kurdî li  
Medresa  
Sor xwendibûn. Melayê Cizîrî ko bi dîwana xwe navdar bû, hem li  
Medresê xwendibû hem jî mamosteyê Medresê bû û li wir wefat  
kiribû û  
hatibû veşartin. Feqiyê Teyran ko şagirtê Melayê Cizîrî bû û di esasê  
xwe  
de dengbêjekî xelkê bû, ko bi şîr û dîwanên xwe nas bû, li wir  
xwendibû.  
Li gora gotinan, seydayê Ehmedê Xanî ko destana Memê Alan quli-  
pandibû ser şîra manzûm û jê şahasereke mîna Mem û Zîn anîbû  
pê, ko  
me jî kitabên wî, nemaze Nûbara ko ewî ji bo me zarokan nivisîbû,  
li  
Medresê dixwendin, li wir xwendibû. Ê hê gelek kesên din ên  
navdar ko  
eserên nemir anîbûn pê.  
Belê, cîhê ko Mîr dil kiribû ko ez lê bûma û min tê de dil, ruh û  
mêjiyê  
xwe terbiye bikira, cîhekî weha yê dengên têkel ên sebir, xîret,  
metanet û  
manewiyatê bû. Aqil ko taca zêrîn bû û di serê herkesî de nîn bû, li  
Medresa Sor, di nav rûpelên kitabên de bû û kitab hemû li hêviya  
min  
bûn.

Mîna niha tê bîra min, gava Apê Xelef di wê roja germ û ronî ya payîzê

de ez teslîmî Mam Sefo kirim û Mam Sefo jî ez birim Medresê û çaxa em

66

di deriyên zexm ên ji darê gûzan re bihurîn û min gava xwe ya yekemîn

avêt dinya zanîn û terbiyê, hingê, li eywanê, berî ko Mam min teslîmî

seydayên Medresê bike, wî, li nik seydayên rûtirş, bi qasî çendekê, ken li

ser rûyê wî, mîna her gavê simbêlbadayî, şal û şapikên rengîn û paqij

şidiyayî, bi fikir û baldarî, li min nihêrî, bi herdu destên xwe qama min a

hinekî xwar rast kir, destê xwe yê rastê bir serê min û kite bi kite gote min;

Biro, guhê xwe bide min, van gotinên min bike guhar û bixe guhê xwe...

li ser daxwaza Mîr, îro heyata te dikeve ser riyê nû, riyê pîroz, gidî tu

bî, tu heta mirinê vê şîretê ji bîr nekî; zanîn, kesê ko li jêr e, bilind dike,

nezanî, kesê ko li jor e, nizm dike.

Bêguman min, bi heyecana xwe ya zarokiyê û heşê xwe yê xeşim, got-

inên Mam û şîreta wî di demeke zahf kurt de, piştî ko ewî Medrese terk

kir û çû, ji bîr kirin, lê belê ew gotin û şîret, bi dû re, car bi car, di nav

rûpelên zerbûyî yên kitaban de û li ser riyên fetloke yên heyata min, her-

tim pêrgî min hatin, kitaban û heyatê ew hertim bi bîra min anîn û ew jî

bûn mîna vî guharê guhê min û bûn perçeyên heyata min, ruh û heşê min.

Dengê terbiya ruh û heşe min, heke ez rastiyê bibêjim, berî ko ez li Medresa Sor dest bi xwendine bikim, kete dilê min. Bêguman bi deng,

hest, coş û alîkariya Apê Xelef ko rûyê min ber bi Medresa Sor, îlim û îr-

fanê zivirand.

Herçiqasî Mîr daxwaz kiribû ko min dest bi xwendinê bikira jî, min dil

nîn bû ko ez biçûma Medresa Sor. Herçend xelkê bi pesn çêl li Medresa

Sor dikirin, ewçend jî bi xof û saw. Seydayên Medresê bi hişkahi û zal-

imiya xwe, feqehên wê bi rûtirşî û maxrûriya xwe, hicreyên wê jî bi tarîti

û tenêhiya xwe nav dabûn. Herkesî pê dizanîbû; tiştê yekemîn ko şagirt

li Medresê hîn dibûn, ço û lêdan bû, da ko şagirt hînî dersan bibin û hemû kitêbên dersan jiber bikin. Jixwe Medrese jî, ji aliyê derve, bi dîwarên xwe yên bilind û bi qermîten xwe yên sor ên çarçik, mîna zîn-

danekê dixuya, ko ji zîndana kelehê jî xirabtir bû.

Çend roj bi dû wê roja pêroz a Newroz û desthilatiya Mîr re, rojekê, çaxa

ez hişyar bûm, taviê, ez ji mezelê min û Heme ko mîna her carê bi fis û

tirên Heme genî bûbû, derketim û çûm nik Apê Xelef ko li axurê bû û

mîheke kulek didoşiya. Straneke kevnare ko gotinên wê bi ayetên kevn ên

cihû û filehan dişibiya, li ser zimanê wî bû. Carina, gava ew bi tenê  
dima,  
mîna ko ew here dinyayeke din, wî stran û kelamên welê digotin ko  
çu  
kesî ne gotinên wan bihîstibûn û ne jî jê fahm dikirin, mîna ko ew jî  
ji

67

dinyayeke din hatibin. Li axura bêdeng ko jê bîhneke giran a tirşokî  
dihat  
û însên jê hinekî saw digirt, ez jî, bêdeng, li kêleka wî, li ser totikan,  
rûniş-  
tim, min elbika şîr hinekî din bir bin guhanên mîhê û guhê xwe da  
ser  
stran û maqamê wê ko gelekî ji maqama stranên ko me dizanîbûn  
cihê bû.

Aşiq û maşûq mifte di dest e

Me miraza xwe ji wan dixweste

Ewan miraza xwe bi heqî dixweste...

Piştî ko wî strana xwe got û elbik heta nivî tijî şîr kir, bêyî ko ji hev  
re

tişteki bibêjin, em rabûn ser piyan û derketin derve. Deriyekî axurê  
rasterast vedibû hundirê malê, lê Apê Xelef îcar di deriyê derve re  
derket.

Li derve ronahiyê leylan dida, asiman zelal, ava çem zelal, hawîrdor  
zelal

bû. Piştî ko me bi qasî çendekê li dora xwe nihêrî, em zivirîn aliyê  
malê

ko dîwar û pencereyên wê bi tîrêjên yekemîn ên keleberbanga sibê  
û bi

şewqa zer ko ji ava aram a danê sibehan a Dîcleyê dirêjî hawîrdor  
dikir,

dibiriqî. Li hundir, em li hember hev, li kêleka pencerê, li ser  
doşegên

rengîn ên rîsîn rûniştin, rûyê me bi tîrêjên tavê ronî, hê jî xew li ser çavê

me, bi qasî kêliyekê bêdeng, me li hevûdu nihêrî. Apê Xelef, dîsan bi

pitepita stranekê, tawika xwe tijî şîr kir, nanê tisî yê hişk tê de hûr kir û bi

kevçiyê xwe yê darî dest bi xwarinê kir û ji min pirsî,

Xorto, ma tu jî naxwazî?

No, min gotê û min rûye xwe jê zivirand û di pencerê re li çemê zelal ko bi rengên keskesorekê şewq dida, nihêrî.

Çi ye? wî pirsî, çi derdê te heye? Mîna ko wî fahm kiribe ko ez li tiştêkî

difikirîm.

Apo, ez ê tiştêkî bibêjim, lê mexeyide, min bi dengêkî gelekî nizm gotê.

Na, kurê min, bibêje, ez ê nexeyidim, çima ez ê bixeyidim?

Apê Xelef, min dil nîn e ko ez herim Medresê, bêyî ko ez lê binihêrim,

min jê re got. Ez naxwazim bibim mela yan jî seyda, ez dixwazim, mîna

te, bibim dengbêj, bibim şivan...

Li ser gotina min, Apê Xelef ko heta hingê gelekî cidî bû, bi qasî çendekê kenîya û paşê dîsan, ji destpêkê, dest bi wê strana êxur kir,

Mêr û melean dan medehan

Û xasê nava qubehan

Ronahî dabû berê sibehan...

68

Min li rûyê qermiçî yê şivanê mîrên botiyan nihêrî, rîh û simbêlen wî spî

dikir, eniya wî bi xêzên umrekî neçar û kal tijî bû, ji ber ko hema çi bigire

diran di dev de nemabû, lêvên wî li ser hev siwar bûbûn. Demarên qiri-

ka wi, mîna ko ew li der bin, sor dikirin. Lê belê çaven wî mîna çavên zarokekî biçûk dilîstin, bi coşa destê sibê, bi heyecana stranê, bi kela jiyê-  
na heyatê... Na, ez fikirîm hingê, Apê Xelef ne şivanekî xirab bû, ji berva-  
jî ew, bi wexta ko her û her diherikî, bûbû şivanekî yekta, hosteyê şixulê  
xwe û zanayê dangan. Lê bêguman hostehî û zanahiya wî, bi keda salan  
û xîreta umrekî hatibû pê, di pey şagirtî, xeşîmî, nezani, şaşî û kêmaniyan  
re hostehî hatibû, xirecirên vala, kar û şixulên rojane, pêwendiyên bê-  
mane, tiştên bêkêr, wextên bêkeys hemû li pey mabû û bi tenê tişteke di  
heyata Apê Xelef de mabû; şivani, bilûr, stran, deng û gotin. Kêfxweşiya  
wî ya heyatê, êdî piştî ko bêrîvanan jê xatir xwestibûn, bi tenê ew bûn;  
berxeke nûzayî ko bi destên hoste yên Apê Xelef, cara yekemîn, pê li erdê  
dikir; straneke nûçêbûyî ko wî bi hinceta dawet û dîlanê yan şîn û tahziyê  
li hev anîbû, kelameke kevnare ya însaniyetê ko ji bîr bûbû û bi dengê  
Apê Xelef vediguhezî nifşên nû; giyayekî nûhêşînhatî ko nîşana heyatê û  
miyaseriya pêz bû; gotineke kemilî ko tê de germahiya însani hebû û  
meseleyeke xweşlihevhatî ko guhdaran her dixwestin lê guhdarî bikin. Ji  
bilî van ne mal û milkê dinyayê, ne şan û şoreta wê, ne jî xirecir û keftûlef-

ta wê xema Apê Xelef bû. Zerikek şîrê teze ko ji guhanên tijî yên mîheke qerqaş dihate dotin, pariyekî nan ê teze ko bi destê pîrejinên cîran li argû- nan dihate pijandin, bilûreke spehî ko ji dewr û dewranên stranên kevnare yadîgar mabû, şêniyekî dilsoz ko hewcedariya wan bi gotina Apê Xelef hebû, guhdarekî bimeraq ko mîna we dixwest deriyê dilê xwe li ber serpêhatî û destanan veke, evîneke germ a bêrîvanekê, ya axa welatê Dîcleyê, ya berbangên sibehê, ya borîna beranekî qert, ya binevşeke nûbişkovî ko hemû perçeyên biçûk ên heyata Apê Xelef bûn û gotineke nerm ko deriyê dil û ruhan vedikir... heyata Apê Xelef ji van hatibû pê. Apê Xelefê ko hîç nediguherî, heke em diranên wî ko roj bi roj kêmtir dibûn, lingê wî yê kulek ko roj bi roj diwartir dibû û xûzîka wî ko roj bi roj pişt lê xwartir dikir, nehesibînin, hîç kal nedibû, car bi car, weha gotibû min, kurê min, hezar riyên hînbûn û zanîne hene, lê belê, ji bo ko tu bikaribî xwe bidî ser riya zanîne, te hêsanî, zelalî û sadebûn divê. Şixulê te çi dibe, bila bibe, lê divê ew zelal, sade û hêsan be, eger xelk ji te, ji şix- ulê te, ji gotina te fahm nake, hingê divê tu bizanibî ko tu ne hostehê şix- ulê xwe yî; hostehî ji tevîheviyê zelalî û sadebûnê, ji zehmetî û zorê jî



hêsanîbûnê derxistin e; zelalî, sade û hêsanbûn li pey çiyayên zor û zehmetan e, eger tu hilkişiyayî çiyân û te xwe ji gopikên wan ko di nav mij û dûmanan de ne, bera jêr da û te xwe ji mij û dûmanê rizgar kir, hingê tu hoste yî... Eger ez dikenim, dilîzim, distrêm, li bilûrê dixim û bi hêsanî dipeyivim, tu bawer meke ko min di jiyana xwe de zehmetî, di- jwarî, zor û kirêtî nedîtine, ji bervajiyê, hemû jiyana min di nav neçarî, zehmetî û kirêtî de bihurî. Min zahf mirin û kuştin, qetl û qetliyam, bindestî û bêgavî dîtin û jiyam. Lê min hertim hewl da ko ez xwe bi ze- lalî, sadehî û hêsanîbûnê bigihînim, ji lewre min ji dudilîbûn, tirs, sûzenî, şik, tiralî, sersarî, tembelî, hesûdî, pozbilindî, zexelî, şixulên derewîn û fortên vala rû bada. Min hertim xwe da ser riya şixulê ko ez dikarim pê rabim, hevalên ko ez dikarim pê re bim, gotina ko ez dikarim jê zelalî û kêfxweşiyekê bînim pê... Tu bî, tu vê yekê çu carê ji bîr nekî, tu gotina min bikî gustîr û tîxî tiliya xwe... Gustîrên Apê Xelef û guharên Mam Sefo ko riya zanîn û terbiya ruh û heş li ber min vekirin... Wê berbangê min li rûyê Apê Xelef ko bi erdekî nûçotkirî dişibiya, ni- hêrî û ez li ders û tecrubeyên wî fikirîm. Xorto, tu çî diponijî? Ewî got û ez ji dinya xem û xeyalan vegerandim nik xwe.

Apo, ez ê çima donzdeh an jî panzdeh salan li wê medresê ko mîna zîn-  
danekê ye, bimînîm? Dewsa ko ez jî mîna te li deşt û zozanan bim,  
li  
bilûrê xim û bistrêm?  
Hingê wî bi qasî kêliyêkê li min, bi baldarî, nihêrî, taweka xwe bir  
de-  
vê xwe û şîrê ko tê de mabû, vexwar û tişteki ko ez hîç li hêviyê  
nebûm, ji  
min pirsî; Biro, ev strana ko min niha got, strana çi bû?  
Stran bû, min gotê, da ko ez bersîvek, lê bersîveke tewş bidimê,  
strana  
şivanan bû.  
No, ewî, gelekî cîdî, gote, no kurê min, no, strana şivanan ji bo mîh,  
berx, bizin, nêrî, kahr, beran, gîsk û celebên din ên heywanan e, ev  
strana  
ko min niha gote, di esasê xwe de, ne stran e. Ew, diwa ye, diwa  
merivan,  
diwaya ronahiyê, berbanga sibê, diwaya me yêzidiyan.  
Bi gotina wî re bédengiyek hate pê, dinya ko nû hişyar dibû, jixwe  
aram  
bû. Ne Gulîzera gulî reşik hê hişyar bûbû, ne jî Hemeyê fistûj. Zincîra  
çiyayên abadîn li dûr di nav mij û dûmanê de, mîna efsaneyên  
kevnare  
ko hertim li ser zimanê Apê Xelef bûn, dixuyan, Çemê Dîcleyê bi  
nazenîn xwe li ba dikir û ber bi jer diherikî. Heyatê li derve jî dest pê  
70  
kiribû, li pey çêm, di navbera çiya û çêm de, kerwanekî dirêj ko ji  
hesp,  
ker û deveyan hatibû pê, ber bi aliyê welatê Mûsil û Basrayê bi rê  
ketibû  
û ji bajêr bi dûr diket. Çend segên tiral li qiraxên çêm baz didan û  
dilîstin.

Qaz, werdek, mirîşk û dîk, peregende, bi dirêjahiya çêm re, herwekî ko

ew jî mîna Apê Xelef kulek bin, digeriyan. Siwarekî li ser mehîneke mezin ko cahniya wê jî li pey bû, ber bi çiyên hildikişiya. Refekî teyrên

mezin ên qulingan jî her wisan ber bi wî alî, li asimana çikî zelal difiriyan.

Min Apê Xelef ko hema çî bigire hertim bi kêf bû, çu carê ewçend cidî

û bêdeng nedîtibû.

Biro, wî disan dest bi axaftinê kir û got, ji bîr meke Biro, navê te ji Brahîm Pêxember tê. Nave te pîroz e, hem navê pêxemberekî hemû dî-

nan e, hem jî bira û hîm e. Navê te, hîmê biratîyê ye. Hemû dîn bira ne,

Xwedayê alemîn, bi gotina me, Yezdanê dilovanê dilovîn, yek e, hemû

dîn jî pê re ne. Çî yezidî, çî misilman, çî file, çî cihû. Navê te tîmsalê hemûyan e... Lê belê divê tu tiştêkî hîç ji bîr nekî, em, tu jî tê de, yezidî

1. Herçiqas li mala me Qurana kerîm hebe û navê Heme ji Mihemed,

resûlê Xweda, were jî, em êzidî ne, xwediyê dînê hemû dînan, zimanê

hemû zimanan, kitaba hemû kitaban... Bav û kalên me weha digotin,

Yezdanê dilovan bi zimanê me yê şêrîn axiviye, ji lewre, kitaba me Mishefa Reş bi zimanê kurdî dahatiye... Lê belê Yezdan yek e; dilovaniya

wî yek e; rehmet, wijdan, merhemet, nûr, germahî, rindî yek e; şev dikarin reş, asiman girtî û heyam cûn bin, lê berbanga sibehê hertim yek

e, berbangeke nû, teze, zelal û sade; rê dikarin gelek bin, lê deriyê zanîna

ruh û dil yek e. Tu here Medresê, tu dê bibînî ko Medrese dê te bide ser

riyeke rast a terbiya ruh, heş û dil...

Dengê gotina niviskî û dengê gotina devkî ji hevûdu gelekî cuda ne.

Di

dengê gotina nivîskî de ko li ser kaxizên bêruh û bêcan ên spî û zer in,

gotin heye, deng nîn e, di dengê gotina devkî de ko bi tenê di bîr û heşê

însên de ye, deng heye, gotin nîn e. Însan li gora daxwaza dilê xwe dengê dide gotina niviskî, lê herçi gotina devkî ye, ew pêşî deng e û bi

dû re, çaxa deng ji devê însên derdikeve, dibe gotin. Gotina nivîskî hazir

e û li ber we ye, hûn wê dixwînin, werdigirin, hînî wê dibin û wê digi-

hînin heşe xwe. Gotina devkî nîn e, hûn wê ji heşê xwe derdixin, di-afirînin, heyat didinê, bi alikariya dengê ko ji devê we derdikeve, bi maqam û şêweyekî xas, hûn wê vediguhezînin kesên hemberî xwe, mîna

ko ez niha dikim. Di van herdu celebên gotinê de, ji deng pê ve, her tişt

71

vajî hevûdu ye. Bi tenê deng wan digihîne hevûdu. Ji ber ko di heyata î-

sên de her tişt bi dangan ve giredayî ye; bi dengê mîna qîrînê hûn tên

dinyayê, bi dengê mîna axînê hûn ji dinyayê koç dikin, di navbera van

herdu dengên ko destpêk û kutahî ne de, bi qasî umrê xwe, hûn dipeyivin

û pêwendiyên datînin, derin û tîn, dixwin û vedixwin, însanan  
dinasin û  
bi wan re dijîn, ders û tecrubeyên heyatê werdigirin û digihînin  
însanên  
din, fêr dibin û fêr dikin, dikenin û digirîn, diqîrin û dilorînin,  
dihebînin  
û dihewînin... û bi alîkariya deng her tiştî dikin. Gava însan  
hosteyê  
deng be, hingê her celeb deng bi hêsanî diqulibin ser gotinan,  
geh ser  
gotina devkî, geh ser ya niviskî.  
Çaxa Mam Sefo ez birim Medresa Sor û min li wir dest bi xwendinê  
kir, hingê, cara yekemîn ez di heyata xwe de pêrgî gotina niviskî  
hatim.  
Rûpelên defter û kitaban li ber min vebûn, herfên mihemedî ko ji  
herfên  
kitabên kitabxana Mam Sefo cuda bûn, li ber min dest bi govendê  
kirin  
û min ji wan herf û gotinên ko ne zindî bûn, dengê û heyateke  
zindî afi-  
rand.  
Roj û heyamên ders û dersxanan, xwendin û kitaban êdî dest pê  
kiribû.  
Di dersxaneyêke biçûk de ko hertim ronî bû û tîrêjên tavê di caxên  
pencereyan re xwe digîhandin hundir, tevî heft zarokên din ko  
zarokên  
malbatên giregiran bûn û her yek ji deverêke Cizîra Botan dihatin,  
cil û  
bergên min nû, porê min bi hevinga dirêj û ko ya Apê Xelef  
qusiyayî,  
guharekî nû yê zêrîn ko Mam Sefo mîna yadîgara Mîr dabû min, di  
guhê

min ê rastê de, li kêleka pencereyekê ko li hewşa fireh a Medresê  
ko hertim paqij û maliştî bû, dinihêrî û kevanê wê mîna heyva  
çardehê mehê ko  
nû hilhatiye, xweşik û spehî, rehleyeke kevn ko şagirtên berî min tê  
de bi  
kêr û çaqûyan hin herfên ko diviya herfên navê wan bûya,  
kolandibûn, li  
ber min, çavê min ê sax geh li ser hogirên min ên dersê, geh li ser  
gul û  
kulîlk an jî kahniya hewşê, di heşê min ê tevîhev de bi sedan, heye  
ko bi  
hezarên deng, min dest bi dersan kir. Pêşî, bi hezar zehmetî û  
teşqelê, bi  
qîreqîr û xirecir, bi şiva darê hinaran ê feqehê min ê bêbav ko navê  
wî  
Evdilstar bû, ez hînî elifbêya erebî bûm. Evdilstar ko gava min şiva  
wi dît,  
tafilê, navê wî qulipand ser Ya Star, bi destxeteke xweşik, li ser  
kaxizeke  
spî, herfên mihemedî, yek bi yek, nivisî û ew yek bi yek, lê car bi car,  
roj  
bi roj, hefte bi hefte, bi mirûzekî tirş û bi sebreke fireh, hînî min kir;  
elîf,  
bê, tê, sê, cîm, hê, xê, dal û herweha yên din... Herfên ko bi mûriyan  
dişibiyan, li ser kaxiz bûn, lê bi nêrîn, xîret û şiva Ya Star ko li kû  
diket jê  
agir diperpitand, ew dibûn deng. Bi dû herfan re gotin hatin,  
gotinên  
72  
nivîskî ko di nav rûpelên kitabên de, bêdeng, bêpejn, bêruh nivistî  
bûn û  
li hêviya min bûn ko ez wan biqulipînim ser dangan û ruh bidim  
wan.

Kitabên ko me dixwendin, piraniya wan bi erebî, hinên wan jî bi kur-  
dî bûn. Ders gelek, kitab zahf, xwendin û jiberkirin bêdawîn, şiv û  
ço  
bêhejmar bûn. Li gora ders û kitabên feqehêk diçû, yekî nû dihat,  
gotin,  
kitab, deng û şêwe diguherîn, lê hişkahiya seydayan, fortên  
melayan,  
bêbaviya feqehan û êşa şiv û çoyan her mîna xwe diman. Melayekî  
me yê  
rîhrîs, çavbeloq, devgirêz û zimandirêj hebû ko navê wî Sebhetullah  
bû.  
Sebhetullah ko min di cîh de navê wî jî qulipandibû ser  
Nehûzûbillah, ne  
bi tenê bi zimanê xwe yê dirêj, lê belê bi şiva xwe ya dirêj jî nas bû.  
Şiveke  
bi qasî çend mîtroyan a wî Nehûzûbillahê ko xwe ji Mîr jî mîrtir  
dihesi-  
band, hebû ko bi hêsanî digihîşte goşeyê herî dûr ê dersxanê. We  
hay jê  
nîn bû ka kengî û çawan şiva mela Nehûzûbillah ê li ser serê we  
çirûsk bi  
firê xista û pêtên agir ê li ber çavê we biçirûsiya. Her cara ko çavê  
min li  
dersxanê bi Nehûzûbillah diket, min bi qîreqîr dursa xwe dixwend;  
Xweda yek e, bê hevrê û bê heval. Ne mezûlî ye, ne mirin, ne  
zewal... tef-  
sîr, mewlûd û gelek ders û kitabên din ên xwendinê hebûn. Lê di  
salên  
pêşîn de min herî zêde ji kitaba Nûbarê ya Seydayê Xanî hez dikir û  
her-  
tim ew dixwend. Nûbar, ferhengokeke biçûk bû ko Seydayê Xanî, bi  
kurmancî, ji bo hînbûna gotinên erebî, nivisîbû da ko şagirtên  
medresan

ew bixwenda. Kitaba yekemîn ko min di tariya şevê û ronahiya rojê  
de  
hertim xwend û jiber kir jî, jixwe, Nûbar bû. Seydayê Xanî ko di  
wextê  
xwe de hal û hewalê Medresa Sor û heye ko hal û hewalê şivên dirêj  
ên  
kambax ko ji mêj ve, perçeyekî Medresê bûn – baş dizanîbû, kitab  
ji bo  
me zarokan lê kiribû û tê de digot,  
Vêk êxistin Ehmedê Xanî  
Navê »Nûbara biçûkan« lê danî  
Ne ji bo sahîbrewacan  
Belkî ji bo biçûkên kurmancan...  
Deriyên zanîne ko ez tê re bihurîbûm û ketibûm nava kahniya  
terbiya  
heş û dil, divê ez bibêjim, di eynî wextê de, heş û dilê min, di  
navbera  
gotina devkî û gotina nivîskî de perçe kir. Ê ne bi tenê hewqas, herçî  
cîhana gotina nivîskî bû, ez li wir jî perçe bûm. Di Medresê de hertim  
qayideyên zimanê erebî û kitabên ko çêla dîne îslamiyete dikirin û  
piranî  
bi erebî hatibûn nivîsîn, hebûn. Lê çaxa min dîwarên Medresê li pey  
xwe  
73  
dihîştin û gava xwe davêt dinya derve, hingê qayideyên cîhaneke  
din li  
dar bûn, qayideyên bilûrvan û dengbêjan ko li ser hîmê gotina devkî  
ava  
bûbû, yê gundî û şivanan ko li ser heyateke sade ya gotina sade  
hatibû  
pê, yê ehlê bajarê Cizîrê ko ji xwendine bêtir bi gotinê heyata xwe  
di-



jiya... Û ya herî girîng jî qayideyên mala Mam Sefo ko ji hemû  
qayideyên  
din ên heyata min cihê bû.  
Min êdî li Medresê dixwar û vedixwar, dijiyam û radizam, lê çaxa  
min  
bixwesta, piştî dersan, danê êvaran, an jî rojê îniyan ko roja  
bîhnvedane  
bû, ez, Biroyê sêwî û kor ko li ber çavê seydayên min, hinekî tiredîn,  
derdiketim derve û diçûm malê û ji wir jî, mîna berê, tevî Heme û  
Gulîzerê, yan jî bi tena serê xwe, di ber qeraxên çem re û di bin siya  
darên  
qedîm ên çinar, bî û berûyan de, diçûm mala Mam Sefo û diketim  
nava  
qayideyên mala ermen ko bi gotinên niviskî yên dîne Îsayê Mesîh  
hatibû  
pê û ji derve hîç nedixuya.  
Li hewş an jî mitbax û mezelên qata jêrîn a malê de em, ez ko ji  
Medresê  
dihatim, Migo ko piraniya caran ji dêrê dihat, Armê ko hertim li nik  
diya  
xwe bû û ji qata jor dihat, Heme ko ji nik Apê Xelef, çêrê dihat û  
Gulîzer  
ko jixwe piraniya caran li mitbaxa mala Mam Sefo bû, digihîştin  
hevûdu  
û me carina bi teşqele û xirecir, carina bi kêfxweşî û henekan, hetika  
hevûdu dibir. Mal mezin, mezel zahf, xizmetkar û qewraşên ko li  
pey me  
bazdana û keleporek ko me li pey xwe, peregende, dihiştin, hildana,  
pir  
bûn. Mitbax, mêvanxane, hewş, bexçeyê kêleka çem, serşok,  
mezelên  
qewraşan, zêrzemîna malê, mezelên bîhnvedanê, evana hemû  
meydana

me ya lîstikê bûn. Lê herî zêde min ji zêzemîna ko însan ji aliyê hundir

ê mitbaxê, bi pêpelûkine kevirîn dadiketê û hertim tarî bû, hez dikir. Gava min keys didît, lê bi şertê ko Armê yan jî Gulîzerê li nik min bûya,

min xwe ji ber çavan winda dikir û ez, tevî Armêya ko mîna diya xwe hinekî merezî bû, yan jî Gulîzera ko hertim cahniyeke nûgîhayî ko hîre-

hîr jê diçû, dianî bîra min, bi dizîka, dadiketim zêzemînê, warê her texlîd kûp, dîzik, elbik, kiloz, tûr, têr, telîs, kîs, sîtil, kodik, meşk ko heta

dev tijî xwarin û vexwarinên şêrîn bûn. Evîna dizan şevreş, daxwaza dilê

min jî tarîtiya zêzemînê bû.

Migoyê ko mîna min dest bi xwendinê kiribû û Hemeyê ko tevî bavê xwe diçû ber pêz, lê wî jî dil hebû bihata Medresa Sor, hevalên min bûn,

lê cîhê Armê û Gulîzerê cihê bû. Ew ne bi tenê hevalên min, lê herweha

şîrkên sirên min bûn jî. Min navê wan jî guherandibû, Armê kiribû Sosinê, Gulîzerê jî Cahniyê. Armê, sosina min a nazenîn, sosineke delal,

74

bejnzirav û jar bû ko li qiraxên çemê Dîcleyê, di nav nêrgiz, binevş, lalezar

û sosinên bêhejmar de, hêşîn hatibû û bi tava germ a welatê

Mezopotamya jorîn diçilmisî. Gulîzerê, cahniya min a qemer, cahniyeke

hov bû ko tûmik û bijiyên wê bi bayê çiyayên Cûdî, Herekol û Gabar li

firê bû û li deşt û zozanên welatê bav û kalan, çeleng û rewan, derketibû

geşt û seyranê. Yek bi dilpakî û zîziya xwe, ya din bi hebînî û  
kêfxweşiya  
xwe dilê min ê teres û zarok, bi heyecaneke xerîb û keleke ecêb,  
digu-  
vaştin.  
Li zêrzemîna malê, me hem devê kûp û dîzikan vedikir û dixwar û  
vedixwar, hem jî lîstikên ko me bi wan dizanîbûn, dilîstin û yên ko  
me pê  
nizanîbûn jî diceribandin. Devê me şêrîn, dilê me germ, bedena me  
nerm,  
em diketin nav cîhaneke din ko ji hemû cîhanên din ên heyata me  
cihê bû  
û tê de bi tenê miraz û xwestek, xewn û xeyalên xeşîm ên zaroktiyê  
hebûn.  
Niha, piştî umrekî dirêj ê kambax û kirêt ko ji zelaî û paqijiya dewr  
û  
dewranên wan rojan êdî gelekî dûr e, ez dikarim bibêjim ko hingê,  
di wan  
roj û salên min ên herî xweş de, li zêrzemina tarî ko cîhaneke ronak  
berpêşî  
min dikir, cara yekemîn, min bîr bi sihêr û quweta xewn û xeyalan  
bir û  
hêdî hêdî, bi alîkariya lîstikên me ko ji xewn û xeyalan dihate pê, ez  
têgi-  
hîştim ko xewn û xeyaleke zelal û sade, li milekî, gelek caran, ji  
quweta bîr  
û nêrînên ko heyata me li me dikin zîndan û nahêlin em di heyata  
xwe de  
jî, nêzîkî li xewn û xeyalên xwe bikin, bi quwettir in û li milekî din jî,  
ji  
rastiyên umrê me ko çu carê ji xem, şik, tirs, dek, derew, bêgavî,  
bîhtengî  
û kirêtiyê rizgar nabin, bêtir û çêtir rast in.

Lîstikên me ko hem lîstikên adetî yê welatê me bûn, hem jî yê nû  
yê xewn û xeyalên me bûn, zahf bûn. Ne hewce ye ko ez niha wan  
ko hê  
jî mîna ko ew do qewimîbin, tèn bîra min, kite bi kite, ji we re  
bibêjim,  
lê di nav wan de lîstikên ko me herî zêde jê hez dikirin, çima ez ê  
tiştê ko  
Yezdanê dilovan pê dizane, ji we veşêrim, lîstikên ko »bilo« tê de  
bûn an  
jî çêl li »bilo« dikirin, bûn.  
Çaxa ez û Armê dadiketî zêzemînê û em li wir dilîstin, carina em  
li  
ser telîsan an jî li tenîştî kûpên hûnik rûdiniştî û me bîhna xwe  
vedida.  
Hingê ewê serê xwe datanî ser milê min û li hêviyê disekinî ko min  
jê re  
tiştîne xweş bigota. Min teksîr nedikir, bêguman piştî xwarina şêrî-  
nahiyên kûpan, min jê re behsa gul û kulîlkan, teyr û tilûran dikir. Di  
esasê xwe de min dil dikir jê re stran bigotina, stranên ko min ê li  
hev  
bianiyana û tê de qala xweşî û delaliya wê bibûya. Lê min hê  
nikarîbû  
gotinên evîn û hebîne li hev bianiya, ji lewre min û wê qîma xwe bi  
got-  
75  
inên gul û kulîlkan dianî. Herçî Armê bû, wê jî behsa diya xwe ya  
nexweş  
ko jê re kitaba Îsayê Mesîh dixwend û roj bi roj xirabtir dibû û carina  
jî  
behsa bavê xwe yê zane dikir, bavê ko bi şixulên Mîr û mîrekiyê diçû  
de-  
verên dûr û gava ew vedigeriya ji Armê re cil û bergên xweşik, şekir  
û şêri-

nahiyên rindik dianî û Armê hildida hembêza xwe û jê re behsa welatên

dûr, zimanên xerîb dikir û ji rûpelên kitaban tarîxa ermenan ko mîna tarîxa kurdan bi derd û keser bû, dixwend. Lê rojekê, ji lîstik û xwarinê

westiyayî, li teniştê kûpekî tijî kakilê gûzan rûniştî, wê rûyê xwe yê zirav

ko bi tesîra siya finda ko li ser kûpê dişewitî û ronahiyeke gelekî qels di-

reşand ser me, hîn bêtir jar û zer dixuya, ber bi min zivirand, bi qasî kêliyêkê bêdeng, li min nihêrî û paşê gote min,

Mayrîg, mamî... Biro, mamî dê bimore. Kahniya aşxara wê dimiçiqe...

Na keçê, min, ecizbûyî, gotê. Çima tu welê diaxivî?

Mamî hew dikare Avederan bixwîne û şaragan bibêje... Nefesa wê diçike.

Hayrîg çi dike? Ma Mamo alîkarî nake? Mîna ko haya min jê nîn be, min jê pirsî.

Hayrîg ji kitabxanê kitaban tîne û jê re dixwîne û dibêje, wê kelegirî got, herdu destên xwe yên biçûk birin ser rûye xwe, hinekî din nêzîkî min

bû û çêl li warê ko min herî zêde meraq dikir, kir;

Gava Mayrîg di xew re dere, ew vedigere kitabxanê, nav kitabên xwe

yên gemarî û tozgirtî û bi saetan, bi şevan, ew li wir dimîne, bêyî ko bi ke-

sekî re bipeyive, bixwe yan jî vexwe... Ew, qelûna wî û kitab û kitab û

kitab...

Dengê kitabên tozgirtî ko di nav rûpelên kitaban de, mîna gotinan, rêzbûyî ye, di esasê xwe de, dengê heyat û tarîxê ye. Her kitabeke çê û

bikêr bi tecrubeyên însanî û zanînên umrekî hatiye hûnandin. Li  
cîhanê  
çu berhemeke hêja nîn e ko tê de keda însan û ders û tecrubeyên  
însanî  
nexuyin. Niha nayê bîra min ka kê gotibû, lê hosteyekî ji hosteyên  
ders û  
tecrubeyên heyata min ko ez ê niha qalê bikim, li dereke weha  
gotibû; her  
berhemeke bedew mîna tavê ye, carina hiltê û cîhanê bi ronahiya  
xwe  
dişo, carina dere ava û li hêviya hilhatinê dimîne. Kitabên tozgirtî  
yên  
qedîm ên kitabxana kêleka çeme qedîm Dîcleyê ko di nav rûpelên  
wan  
de ders û tecrubeyên însanî carina bi qîrîn, carina bi lorîn, olan  
didan,  
hema çi bigire bi tamamî tavên avaçûyî bûn ko ji Mam Sefo pê ve  
kesekî  
rêz û rêzdarî nîşan nedida û ronahiya wan a veşartî nedidît. Belê,  
ew tav  
76  
bûn, lê tavên welê ko li hêviya ruhekî bimeraq, daxwazeke bêpayan  
û  
dilekî birîndar bûn, da ko ji nû ve hilwerin û bi şewqa xwe hawîrdor  
ronî  
bikin, dilê birîndar bicebirînin, ruhê bimeraq hinekî haş bikin.  
Ez jî jixwe însanekî welê bûm û hê jî, tevî ko ez êdî li ser riya çûyina  
bêveger im, welê me; ruhekî bimeraq ko hertim li pey zanîn, ders û  
tecrubeyan e, daxwazeke bêpayan ko li pey hedef û armancên ko  
mîna  
Cûdî bilind in, û dilekî birîndar ko ji zaroktiyê heta mirinê şûr û  
xencer

bûne qedera wî û şopa şûr û xenceran hertim pê re bûne. Kitabên  
tozgirtî  
yên kitabxana Mam Sefo hewcedarî dil û ruhê min ê xeşîm bûn, da  
ko  
wan dest bi axaftinê bikira, ronahiyeke germ bireşanda ser  
hawîrdor. Ez  
jî hewcedarî kitabên bûm, da ko mîna tovê bin axê, min ji kitabên  
ger-  
mahiyek, nermahiyek werbigirta, zikê axê biqelişanda, hêşîn  
bihatama,  
serî rakira, mîna darên çinaran ko li qiraxên çem bûn, reh û rêçên  
xwe di  
dilê axa reş de berda, bi gewdê xwe yê qehîm bilind bibûma, bi şax,  
çeçil  
û pelên xwe bibûma tîmsaleke biçûk a ders û tecrubeyên  
însaniyetê...  
Hûn dibihîsin, ez, zarokekî bi qasî bihustekê, Biroyê sêwî ko kesekî  
wî  
nîn bû, li pey xewn û xeyalên weha giranbiha bûm. Ez niha  
têdigihêm;  
gotinên min qure, daxwazên min bilind, rîya min ji rîya însanên din  
ci-  
hê bû, ji ber ko min dixwest, ez cihê bûma, ne dareke ji darên  
bêhejmar  
ên daristanekê, lê çinareke qehîm a li qiraxê çemê Dîcleyê ko ji dûr  
ve jî  
dihate nasîn. Min dil nîn bû ko ez mîna herkesî bûma. Bila yeqîna  
we ji  
Xweda hebe, min bi gotinên xwe yê qure fort nedavêtin, dek û  
dolab  
nedigerandin, xwe mezin, xelkê biçûk nedidît, lê ez bi tenê welê  
bûm, di

nav hemû riyên heyatê de ko ez pêrgî wan dibûm, min dil dikir riya xwe

ya xas peyda bikira. Ji lewre jî diviya min xwe bi kitabxanê û kitaban bigîhanda.

Migo jî dest bi xwendinê kiribû, lê ne li Medresê, li dêrê. Ermen ko ji

hezeran salan û vir ve, mîna me, ehlê vê axê bûn, bi belavbûn û pêşketi-

na dîne Îsa Mesîh, bûbûn file û filehan cîhên taybetî yên xwendin û per-

werdeyiyê hebûn. Migo danê sibehan diçû dêrê, danê êvaran jî li malê, li

qata jorîn, li mezeleke biçûk ko li nik kitabxanê bû, li ber destê mamostayên xas ko Mam Sefo ew ji bo zarokên ermen, ji Stenbol û Bêrûdê dabû anîn, dixwend. Gava me hevûdu didît, min jê re çêla ders û

mamostayên xwe yên Medresê, ewî jî ji min re çêla dêr, keşe, ders û

mamostayên xwe yên malê dikir. Bi dû çûyina min a Medresê re bi qasî

salek, salek û nîvê, rojek ji rojên payizê ko germahiya tavê hê jî xurt bû û

baranên navdar ên Dîcleyê hê nehatibûn, danê êvarekê ko tîrêjên tavê li

77

ser sînga çiyayê Cûdî leylan dida û ava çêm bi rengê belek ê sor î tarî

dibiriqî, li malê, min jî da pey Migo û em hilkişiyên jor, mezêlê xwendin

û perwerdeyîya Migo ko gelekî biçûk bû û tê de ji du kursî, maseyeke

biçûk, refekî kitaban û li dîwarên spî jî lewheyê Îsa Mesîh ko serê wî di



nav ronahiya tavê de bû, pê ve çu tişt nîn bû. Mamostayekî navsal,  
rûqe-  
merî, simbêlboq û rûgeş, bi cil û bergên alafranga, li hêviya Migo  
bû.  
Gava ewî ez dîtîm, hinekî şaş bû.  
Tu kî yî, xorto, wî pirsî.  
Ez Biro me, min gotê.  
Biro, hevalê min e, Migo jî lê vegerand.  
Tu file yî? wî bi meraq domand.  
Naxêr, ez, êzidî me, min li pêna wî ya xweşik a murekebê ko di  
destê  
wî de bû, nihêrî û got.  
Biro li Medresa Sor dixwîne, Migo got.  
Êzidî û Medresa Sor, mamosta, hîn bêtir şaşbûyî, got, lê nexwest  
goti-  
na xwe bidomîne û mijar guherand, baş e, xorto, em ê niha dest bi  
dersa  
xwe bikin, tu dixwazî çî bikî?  
Ez dixwazim li we guhdarî bikim, min gotê.  
Lê em ê bi zimanine ko tu jê fahm nakî, bi ermenî û fransewî,  
bipeyivin, tu dê eciz bibî, wî got û nerazîbûna xwe nîşan da.  
Ma tu çima naçî kitabxanê Biro? Migo got, Bavo li kitabxanê ye. Wî  
tu  
dipirsî...  
Min xatir ji mamosta xwest, ez û Migo ji derî derketin û çûn ber  
deriyê  
girtî yê kitabxanê, li ber derî Migo cil û bergên min rast kirin, bi  
hêdîka  
li derî xist û li hêviya bersîvê ma. Bi dengekî berz re, em ketin  
hundir,  
Mam Sefo li wir, mîna cara berê ko min dîtibû, simbêlbada yî, li pê,  
li ber

deriyê şaneşînê, qelûn di dev de, lê îcar di nav şal û şepikên botî de,  
biken,  
li me dinihêrî. Serê maseya kitabxanê ya gelekî dirêj tijî kitab bûn,  
kitabine peregende jî li dora kursiyê ko hinekî ji deriyê şaneşînê dûr  
bû,  
li erdê bûn. Tafilê min çavê xwe li dîwaran gerand, ref, kitab û  
lewheyên  
li ser dîwaran li cîhe xwe bûn.  
Û teyrê tawis jî, ko min her û her li bejn û bala wî, li şekl û rengên  
wî,  
li deng û xwendina wî meraq kiribû, li wir bû.  
Biro, malavayo, tu li kû yî? Mam Sefo, bi dengê xwe yê gur ko di  
navbera qîrîn û orînê de bû, gote min.  
Biro hertim tê, bavo, Migo, bersîv dayê, lê em naxwazin te eciz  
bikin.  
Ez ê vegerim dersê, ma Biro dikare li vir be, heta ez dersê xelas  
dikim?

78

Tu here, tu here Mamo got, jixwe min jî dixwest Biro bidîta.  
Tevî ko Armê behsa toz û gemarê fikir, li kitabxanê her tişt, refên  
dîwaran, kitabên li ser refan, mehfûrên li erdê, mase û kursiyê wê,  
kur-  
siyên ko li milê din ê kitabxanê bûn, lewheyên li ser dîwaran, paqij  
û nû  
dixuyan. Maseya ko bi renekî qahweyî dibiriqî, mîna ko ew nû  
hatibe  
cîlakirin, germahiyek dida însên. Kitabxane ronî bû, ji deriyê  
şaneşînê û  
pencereyên fireh ên kitabxanê Dîcle, darên bî ko li qiraxên Dîcleyê  
bûn,  
li pey Dîcleyê jî Cûdî dixuya.  
Were Biro, malneşewitiyo were, Mamo gotê.

Min hêdîka gava xwe avêt hundir, mîna ko ez bikevim cîhaneke nû  
ko  
ji bedewî, spehîtî, bêdengî û hizûrê hatibû pê. Ez raste rast neçûm  
nik  
Mamo, pêşî ez ber bi masê çûm, min bi destê xwe, mîna ko ez destê  
xwe  
bibim porê Armê, koşeyên masê mist dan û li kitabên ko peregende  
li ser  
masê bûn nihêrîn. Tîrêjine soreron li ser masê û pişta kitaban  
dibiriqî. Ji  
wir jî ez hêdîka çûm ber dîwarê ko lewhe lê bûn û ez li ber lewha  
teyrê  
tawis rawestam, min serê xwe hinekî bilind kir û lê nihêrî.  
Çarçoweya ko  
bi renekî zîvîn hatibû neqîşkirin, teyrê ko di nav ronahiya rengên  
bêhe-  
jmar û bêpayan de, stûyê dirêj li jor, sîwanê rengîn vebûyî, bi çavên  
biçûk, maxrûr, nazenîn, li min dinihêrî, sikûneta ruhî ya kitabxanê,  
tafilê, na ne tafilê, hêdîka, digîhand dil û ruhê însên. Bi qasî  
çendekê, ji  
milê rastê, ji milê çepê, geh ronahî li vî milî, geh li wî milî, mîna ko  
ez di-  
ayeke yêzidiyan an jî rêzine ji mewluda misilmanan bixwînîm û pê  
re  
herim, bi bihîstiyariyeke welê, min li teyrê tawis nihêrî. Heke Mamo  
deng nekira, heye ko ez ê bi qasî demeke dirêj, welê jixweveçûyî, li  
ber le-  
whê rawestiyama. Lê ez bi dengê Mamo li xwe warqilîm.  
Biro, ho Biro, heşê te li kû ye? Were nik min.  
Ez bi gavên zahf giran, çavê min li ser ref û kitaban, çûm nik wî,  
teniş-  
ta derî. Mîna ko Mamo bi deng û pêjnên ko di dil û ruhê min de olan  
di-

dan, bihese, wî pirsî,  
Tu ji kitaban, kitabxanê û vê derê hez dikî, ne welê?  
Belê, min kin û kurt, gotê.  
Tu dixwazî bibî çî, wî dîsan pirsî, mamoste, seyda, alîm, nivîskar?  
No, min gotina wî birî û got, no, ez dixwazim bibim dengbêj.  
Denbêj, wî gotina min, lê bi dengê xwe yê qert, dubare kir...  
dengbêj û  
kitab... Baş e, tu dê çî bi kitaban bikî, heke tu dixwazî bibî dengbêj?  
Ez dixwazim dengê kitaban bibihîzim, ez dizanim, kitab tijî deng in,  
di  
nav rûpelên kitaban de her texlîd deng hene...

79

De werin vê ecebê! Mamo, şaşbûyî, got. Biro, xortê çeleng û  
têgihîştî,  
kî te hînî gotinên weha dike? Seydayên te? Hinên din?  
No, min got, ez pê dizanim, ma kitab ne tijî deng in, dengên heyatê?  
Çawan? Dengên çî? Mamo, mîna ko min heşê xwe winda kiribe, bi  
dîqet, li min nihêrî û got. Di kitaban de deng nîn in, herf, kelîme û  
gotin  
hene.

Ma herf û gotin ne deng in?

Wî dengê xwe birî, bi heste agirê qelûna xwe gur kir, çavê wî li min,  
jê çend nefesên kûr kişand. Dûmana qelûnê, gurz bi gurz, di deriyê  
ko hinekî vekirîbû re, ber bi derve kişiya. Paşê, mîna ko tiştê ketibe  
bîra wî, ew zivirî nik masê, ji ser masê kitabeke gelekî qalind û mezin  
ko bi devûrû

vekirî, wergirt û vegeriya cîhê xwe yê berê. Wî herdu qumçikên  
jorîn ên

gomlegê xwe yê pembûyê spî jî girt, deriyê şaneşînê vekir û got,  
Were Biro, were. Dev ji dangan berde û were, ez ê tiştê nîşanî te  
bidim.

Em derketin şaneşîna fireh ko hemû Dîcle mîna marekî ko çiv dida,  
ji

pira ser Dîcleyê, bi dû pirê re keleh û qesra Mîr û li milê jêr jî heta  
erdên  
hêşîn ko bi daristaneke biçûk a darên bî, spîndar û mazû, ji ber  
çavan  
winda dibû, dixuya. Li herdu milên şaneşînê kursîne nizm û  
maseyên  
biçûk hebûn. Em çûn ber bi milê rastê û li ser kursiyan rûniştin.  
Mam  
Sefo kitaba ko bi çermekî tarî yê qehweyî cîldkirî bû, danî ser masê,  
kur-  
siyê min hinekî ber bi xwe kişand û rûpelên kitêb ên gelekî zerbûyî  
vekirin. Li dereke kitabê ko tê de çermekî sor hebû, ew rawesta û  
rûpelên  
vekirî nîşanî min da. Min ji rûpelan çu tişt fahm nekirin. Rûpel bi  
herfên  
latînî lê bûbûn. Lê di rûpelê milê rastê de sûretek ko bi qasî nivê  
rûpelê  
bû, dixuya.  
Heke tu zimanê kitabê meraq dikî, ez bibêjim, Mam Sefo, sakîn, got.  
Kitab bi fransewî ye. Lê tu ji min re bibêje ka ew kesên ko tu di resim  
de  
dibînî, kî ne?  
Di sûretê zahf bedew ko bi qelemeke reş û her kite bi hostahiyeke  
zarîf  
lêbûbû de, çemekî dirêj û fetloke ko bi Dîcleya me dişibiya û tê de  
leşk-  
erên bêhejmar ên çekdar, li milê çepê çêm, li ser girekî, girseyeke  
însan ko  
di destê wan de çek û pûsat, qîreqîr dikirin, li milê rastê jî dîsan  
şêniyeke  
boş ko li erdekî mîna deştê, bi dest û mil, bang dikirin, dixuya. Ne ji  
cil

û bergên wan, ne ji çek û pûsat, ne jî ji rû û rûçikê wan fahm dibû  
ka ew  
kî bûn.

Ez nizanîm, min got...

80

Ez dizanîm ko tu nizanî, Mamo, kenek li ser rûyê wî yê gulover, got.

Ez

bibêjim te, ev kesên ko li milê çepê ne, bav û kalên te kardux in, ev  
kesên

milê rastê, bav û kalên min, ermen in û ev kesên ko li çêm in,  
yewnanî ne.

Milê çepê, welatê karduxan, milê rastê jî welatê ermenan e û ev  
çemê ko

tu dibînî, çemê Botanê ye. Ev bûyer berî niha, kêr zêde, bi du hezar  
û

du sed salan qewimiye. Nivîskar û kumandarekî yewnanî ko bi xwe  
jî tê

de bûye, hem ev bûyer û hem jî gelek bûyerên din ên rêwîtiya  
yewnanan

nivîsiye... Di vê kitabxana ko tu dibînî de, bi sedan, bi hezaran  
kitabên

weha hene. Di kitaban de deng nîn e, lê tarîxek heye, tarîxek ko di  
vê ger-

emola osmaniyan û navçê de, me zahf hewcedarî pê heye... Ez  
dibînim

ko tu li pey riyekê yî, li riyekê digerî. Fermo, were kitabxana stûxwar  
ko

jixwe li hêviya mêvanan e, kengî dilê te bixwaze, kengî wextê te  
hebe,

were, heye ko kitab alîkariya te bikin. Ez ê bi Migirdîç, mamostayên  
wî

û keyayên malê re bipeyivim da ko tu bi serbestî werî kitabxanê û  
ew

hemû alîkariya te û pirsên te bikin. Ma nabe?  
Germahiyek bi ser min de hat, çavê min tijî bû hêstir, ez rabûm pê,  
heta  
ber caxên şaneşînê çûm, li milê jor, li keleh û qesra Mîr, li Cûdiyê  
serî li  
asimanan, li darên bî ko bi rengê mîna rengê xweliyê, ber bi  
asimanan  
bilind dibûn, nihêrî, carek, du caran ji milekî heta milê din çûm û  
hatim,  
paşê, çend dilop hêstir li ser rû û hinarikên min, vegeyriyam û çûm  
destê  
Mam Sefo.  
Mamo, min bi dengê ko ji kela dilê min şikestî bû, gotê, Mamo,  
heke  
min per û bask hebûna, ez ê niha bifiriyama.  
Lê belê, tevî spasdariyê, min dev ji înadaxwe berneda û bersîva xwe  
jî,  
mîna pirs, gotê;  
Mamo, ma tarîx ji dengê nayê pê? Ma çaxê em dixwînin, herf û  
kelîmeyên kitaban nabin deng?  
Dengê Keso ko di kitaba ko Mam Sefo nîşanî min dabû de olan dida,  
yek ji dengên esasî yê kitabxanê bû. Deng gelek bûn û hemû  
hevalên  
min bûn, an jî ez weha bibêjim, hemû, gav bi gav, roj bi roj bûn  
hevalên  
min û bi hev re, mîna dengê yekgirtî yê ders û tecrubeyan, dengê  
min  
terbiye kirin. Ji wê roja ko min niha qalê kir û pê de, êdî her roj,  
danê  
êvaran û rojên îniyan ko rojên bîhnvedanê bûn, ez li kitabxanê bûm.  
Siûda min, mîna siûda mîrekiya Cizîra Botanê, siûdeke bêpayan bû;  
geş,  
xweş, pêngav bi pêngav pêşketî, germ û bi heyecan.

Bi hatina Mîrê Zirav re, siûda mîrekiyê ko ji ber xirecir, şer, dijîtî, berberî û cehaletê hertim reş bû, qulipîbû ser ronahî, geşî û pêşketinê.

81

Tevî ko Mîr gelekî xort bû, wî şixulên mîrekiyê bi hunereke welê digrand ko di tarîxê de nehatibû dîtin; aştîyeke qehîm di navbera eşîr,

navçe, dîn, terîqet û ehlê mîrekiyê de hatibû pê. Mîrekiyê ko pêşî aştîya

xwe ya hundirîn anîbû pê, bi mîrekiyên din ên kurdan re jî pêwendiyê

samîmî û xurt ava kiribû û hema çî bigire bûbû mîrekiya herî girîng a

hemû heremê. Cizîrê û der û dorên Cizîrê bûbûn navenda tîcaret û bazir-

ganiyê, kerwan diçûn, kerwan dihatin, ji welatê Romê bigire heta welatê

Basrayê û welatê Çînê hemû mal û heyinên Anatolî, Mezopotamya û

Asyayê dihatin û diçûn. Dirav zahf bûbû, dewlemendî fireh dibû, tevî

dewlemendiyê karxane, dûkan, xan, qonax, bazar ava dibûn. Medrese û

mizgeft tijî dibûn, dêr, hawre û cîhên dînî yên din ên cihû, ermen, suryan, keldan û nastûran bi pêş diketin. Alîm û zane dihatin û li Cizîrê

bi cîh dibûn.

Herçî ez bûm, min jî du cîhan, na cîhan gotineke mezin e, du hêlîn ava

kiribûn; Medresa Sor û kitabxana Mam Sefo. Li Medresê ez hînî kitabên

erebî, îlmê îslamê, hesab û erdnîgariyê, felsefe û edebiyatê dibûm. Lê belê



ji hesab û hendesê, felekiyat û kitabên tevîhev ên felsefa Îslamê  
bêtir min  
ji çîrok, efsane, serpêhatî û gotinan hez dikir. Memê Alan û Mem û  
Zîn'a  
Seydayê Xanî ko ez ê şeveke din, çaxa gotin were ser gotinê, qal  
bikim,  
Şêxê Senan û şîrên Feqiyê Teyran ko bi zelalî û mijarên xwe, gelekî  
bi  
yên şairê ecem Ferîdûn Ettar dişibiyan, çîrokên Leyl û Mecnûnê ko  
min  
dikaîbû bi erebî û kurdî bixwenda, Yusif û Zuleyxa ko ji Tewratê  
derdi-  
hat û bi kurdiyeke zelal lêbûbû, Ferhad û Şêrîn ko mîna Memê Alan  
evîneke bêpayan lê xizîn vedigot, Rustemê Zal ko çîrokeke hevbeş  
a kur-  
dan û eceman bû, Gulîstan û Bostana Sadî, Dîwana Hafizê Şirazî,  
çarînên Xeyam, Mesnewiya Rûmî û Şehname Fîrdewsî ko alayên  
herî  
bilind û rengîn ên edebiyata Rojhilatê bûn, bala min dikişandin û  
min  
ew dixwendin.  
Bêguman Melayê Cizîrî jî ko jixwe tevî rêz û şîrên xwe, heyat û tirba  
xwe, hertim, bi me re bû. Tirba Mele li teniştê Medresê û mizgefta  
wê bû.  
Ez nizamim ka niha çawan e, lê hingê yek dikarîbû hem ji aliyê  
mizgeftê  
biçûya mezê Mele, hem ji aliyê derve. Ez ji aliyê hundir, di  
mizgeftê re,  
ko bi deriyekî nizm û biçûk vedibû hicreyeke gulower ko ji kevirên  
reş ên  
şehkirî yên zinarên Cûdiyê lêbûbû û ji wir jî di qulikeke teng re, bi  
nêrde-

wanên teng ko ji navenda hicrê ber bi jêr, mezelê Mele dadiket,  
diçûm

nik Mele. Di mezelê Mele de, ji bilî tirba Mele ko bi qedîfeyekê kesk  
ê gi-

ranbiha yê tijî rêz û hedîs, hatibû rapêçandin, tirbine din ko yên ehlê  
mal-

82

bata Mîr Eziziyar bûn, hebûn. Lê gava ez dadiketim mezel, raste  
rast

diçûm ber tirba Mele, min caw radimûsî û di destê min de dîwana  
Mele,

li teniştê kêla tirbê rûdiniştim. Mele ko di dîwana xwe de gotibû,  
»heta tu

dewr û dersan nekê tekrar û mesrûf / di dinyayê tu nabî ne meşhûr  
û ne

marûf«, bi rêzên xwe yên bijarte, bûbû yek ji seydayên min ên  
bijarte ko

riya meşhûrî û mesrûfiyê nîşanî min didan. Gava bîhna min teng  
bûya

yan kêfa min ji tiştê re bihata, yan min dil hebûya destaneke nû  
bixwenda yan jî gotinên straneke nû li hev bianiya, min xwe davêt  
bextê

Mele ko bi comerdî, zelalî û evîna xwe nas bû û herkesê bêgav, li  
nik xwe,

diheband.

Di şevbuhêrkên me yên Medresê de jî, piştî ders û xebatê, em şagirt  
û

feqe, li meclîsa medresê, li hev dicivyan û me li meqam û awaza  
gotina

devkî guhdarî dikir. Çîrok û destan zahf bûn, şagirt û feqeyên ji  
deverên

Serhed û Bazîdê, Şîkak û Urmîyê, Mikus û Bedlisê, Diyarbekir û Fîsê,  
Heran û Ber-Firatê, Mêrdîn û Torê, Hekar û Behdînanê ko gelekî dil

dikirin bibûna hafizên yekta, stran û destanên deverên xwe, di direjahiya

şevên westiyayî û bêdeng de, bi gelek deng û celeban, mîna tizbiyeke not

û neh libî, li pey hev rêz dikirin. Di wan şevbuhêrkan de, gava gelekî pêwist nebûya û şagirtan zorê nedane min, min nedigot, lê guhdarî dikir.

Ji bilî Memê Alan ko hema çî bigire em hemû zarokên Cizîra Botanê pê

mezin dibûn, kêfa min ji Xecê û Siyabend ko çêla evîneke keserkûr ko li

çiyayê Sîpanê Xelatê dawî dihat, dikir. Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekaran ko bi devê zelal û sade yê Hekaran her dîsan çêla evîneke zîz

dikir û destana Dimdimê ko çêla berxwedana mîrekî kurd, Xanê Lepzêrîn û ehlê wî yê keleha Dimdimê dikir, dihat. Ev hemû çîrok û destan, tevî lehengên xwe, bi xêra wan şevbuhêrkan, ji wan şagirt û feqe-

han bêtir bûn hevalên min, şîrîkên ders û tecrubeyên heyata min. Herçî hêlina min a din bû, li wir jî deryayeke zelal û bêdawîn ji kitabên

têkel ko bi zimanên xerîb lêbûbûn, hebû. Li kitabxana Mam Sefo, bêgu-

man, kitabên ko bi zimanê kurdî, erebî û farisî lêbûbûn û min jî êdî dikarîbû bixwenda, hebûn, lê piraniya kitaban, li gora ko Migo û mamosteyên wî şerh dikirin, bi zimanên ermenî, aramî, latînî, romî, îtalî

û fransewî bûn. Di nav rûpelên wan kitaban de cîhaneke gelekî cihê, bi

herf, cimle, gotin, mijar, serpêhatî, wêne, dîmen, xêz û rêzên xwe, silav li

min, li rebenê Xwedê ko gelekî dûrî wê cîhanê bû, dikirin... Min bi wan

zimanan nizanîbû û heke ez rastiye bibêjim, min ne dil, ne jî taqet hebû

ko ez wan hîn bûma jî, lê jiber bextê min ê çê, li teniştta min, hevalê min

83

Migo ko min navê wî kiribû Hûro, ko ji kitaban bêtir bala wî li ser xwar-

inê bû û mamosteyên wî ko ji bilî dersan têkilî tiştê nedibûn, hertim

dûrî însên bûn û mîna rêzên kitabekê bersîva pirsîyan didan û Mam

Sefo ko carina, bêtir jî rojên îniyan, danê êvarê, dihate kitabxanê û ders û

şîret didan min, hebûn. Her çi tiştê ko min dil fikir bipirsîya û bizanibûya, bêyî ko ez şerm bikim an li rewşê bifikirim, kitabên ko ez lê

hûr dibûm di destên min de, heşê min bi dengên kitabên têkel tijî, ez

diçûm mezê Migo û mamosteyan, min li derî dixist, biken, diketim hundir û rasterast daxwaza dilê xwe dipirsî;

Rêzên vê kitabê jî, mîna zimanê frengî, ji milê çepê tîn xwendin, ne

welê?.. Navê vî şervanê ko şûr di dest, tîr û kevan li mil, diqîre, çi ye?.. Ev

kesê rîhdirêj ko dikene, ev kitab lêkiriye, ne welê?.. Ev bergehê hanê ko

çêl li qada şer, mirin, kuştin û xwînê dike, li kû, çawan, kengî qewimiye?..

Ev çi war û welat e ko jê dûman radibe?.. Ev derya ko diqelişe, li kû ye,

navê wê çi ye? Ev însanên ko li berê ne, çi kes in, ji kû tîn, derin kû?.. Ferq

di navbera van herdu kitab û zimanan de çi ne?..

Belê, herçawan ko ez bi xêra gotina devkî ya Apê Xelef, dengbêjên  
Cizîrê, şagirt, feqe, mela û seydayên Medresê, hem hînî deng û  
pêjnên  
welatê kurdan û hem jî hînî hêvî û kêfxweşî, derd û keserên însanî  
bûm,  
herwelê, bi xêra gotina nivîskî ya gelek zimanên ko min dizanîbûn û  
nizanîbûn, ez hînî dengên zindî yên însanî ko carina germ, carina  
sar, ca-  
rina zelal, carina tevîhev, carina çê, carina jî kirêt bûn, bûm. Li  
kitabxanê,  
di nav wan kitabên bêhejmar de, hin kitabên ko bergên wan ên bi  
çerm  
cîldkirî bi hev dişibyan, bêtir bala min dikêşandin. Ji aliyekî Mam  
Sefo  
rast digot, kitab napeyivin, lê ez dikarim piştî tecrubeyên umrekî vê  
yekê  
bibêjim ko kitab, heke ne hemû bin jî, kitabeke bi hostehî, bi ked,  
xîret  
û evîna însanî lêbûyî, bîr bi hal û hewalê însên dibe û bi awayekî  
welê  
nêzîkî li însên dike ko însan bivê nevê, bixwaze, nexwaze, bêgav, di  
nav  
bêdengiya ko kitab tîne pê de, bi kitabê re dipeyive, pê re  
hevaltiyeke  
germ ava dike û sohbeteke xweş, geş û bikêr li dar dixê.  
Kitabên ko herî zêde bala min dikêşandin, min rûpelên wan diquli-  
pandin û li bergeh û sûretên tê de dinihêrtin, di destpekê de, bi  
alîkariya  
Mam Sefo, kitaba Keso ko çêla deh hezar leşkerên yewnanî dikir,  
leşk-  
erên ko ji welatê xwe derdiketin, diçûn Babilê, li wir şikesteke xedar  
dixwarin û bi hezar zehmetiyan, di welatê Med, Kardûx, Ermen,  
Derya

Reş, Stenbol re dibuhirîn û xwe digîhandin welatê xwe. Bi dû re jî min ji

Tewrata ko çêla zehmetî û dijiwariyên ko ehlê benî îsrael dîtibûn dikir,

84

kitabê Maro ko çêla qehremanekî ko ji bêgaviyê dev ji welatê xwe yê şe-

witî û xirbebûyî berdida û dikete ber pêlên welatê xerîbiyê, dikir, kitabê

biçûk a Naso ko hem çêla şox û şengê, kêf û henekê, evîn û eşqê, hem jî

derd û keserê, hesret û bêrîkirinê dikir, hez kir. Ji ber ko nave nivîskaran

dirêj û ecêb bûn, mîna ko min hertim dikir, min ew jî li gora daxwaza dilê

xwe guherandin û bi navine nû ko di bîra min de diman, bi nav kirin. Ev

kitabên ko ez niha qalê dikim û yê mîna wan hemû, bi çerm cîldkirî, bi

neqşên zêrhêlî hûnandî, navê kitab û nivîskar li ser berg, bi xeteke gelekî

spehî lêbûyî, mezin û bedew li kêleka hev, li ser refekî ko nezîkî dîwarê le-

wha teyrê tawis bû, rêz bûbûn. Kitab bi sûret û xêzên gelekî spehî ko î-

sên dikarîbû tê de hemû kitekitên kitabê bidîta, tijî bûn. Sûret bi pênuşa

reş lêbûbûn û hemû bi destê hosteyekî hosteyan ê resimê afirîbûn. Ne

hewce bû ko însên kitab bixwendina, çaxa însên li sûretên kitabên dini-

hêrî, tafilê, têdigihîşt ka kitab û ew rûpelên kitabê ko sûret tê de bûn, qala

çi dikirin. Danê êvaran, piştî dersên zimanê kurdî û erebî, ez ji Medresê,  
cîhana îlmê îslamiyet û Rojhilatê derdiketim, bi lez û bez, carina di kolanên teng ên bajêr re, carina bi dirêjahiya çêm re, di ber darên qehîm ên Dîcleyê re, tevî ko ez westiyayî bûm, min xwe digîhand mala Mam Sefo, li mitbaxê, bêyî ko ez bala xwe bidim tiştêkî an jî mîna berê, bi qes-  
ta lîstikê, lîstikên »bilo« jî tê de, herim nik hevalên xwe, min çend parî qeliya sêlê, seriyekî pîvaz an îsotek dixist nav pariyeke nan û hildikişiyam jor, kitabxanê. Çaxa min deriyê qehîm ê kitabxanê vedikir, cîhana min a din ko bi deng û pêjnên dewr û dewranên gelekî dûr tijî bû, bi com-erdiyeke bêpayan, xêrhatinî li min dikir û hemû tiştên xwe pêşkeşî min dikir.  
Mîna ko ez li Medresê dest bi xwendina Quranê bikim, an li teniştata tir-  
ba Melayê Cizîrî dest bi xwendina beytan bikim, welê bi rêz û rêzdarî, bi hizr û dîqet, ez pêşî diçûm ber dîwêr, nik teyrê tawis, min bi qasî kêliyekê lê dinihêrî, nêrdewana ko ji bo kitabên jorî refan li kitabxanê bû, dikêşand û dianî ber dîwêr, hildikişiyamê, bi destê xwe çarçowe û resmê teyrê tawis mist dida, paşê ji ez diçûm ber refên kitaban û min kitaba ko wê rojê min dil dikir, ji ref werdigirt û rûyê min ber bi dîwêr, teyrê taw-

is, şaneşîn û Dîcleyê, ez li erdê, li ser mehfûrên rengîn ên bi neqşên  
be-  
dew ên Cizîra Botanê hûnandî, berbixûn, dirêj dibûm û min rûpelên  
kitaba mezin vedikirin. Gotina Armê rast bû, tevî ko berdestên malê  
her  
hefte an jî du heftan carekê kitabxane dimaliştin û toza kitaban jê  
dibirin,  
ji kitaban bîhneke ecêb ko hinekî bi bîhna încas û hejîrên çilmisî  
dişibiya  
85  
û nefesa însên diçikand, bilind dibû. Lê ne xem bû, bîhna kitaban jî  
aîdê  
wan dewr û dewranan bû ko kitab jê dihatin. Pirî caran tîrêjên sor  
ên  
taveke qels li ser rûyê min, dengê ava çêm li ber guhê min, min  
rûpelên  
zerbûyî vedikirin, ez li ber her rûpelê ko tê de sûret, xêz, bergeh an  
jî şek-  
il hebû, disekinîm, bi qasî çendekê min li wan dinihêrî û paşê ez bi  
wan  
re dipeyvîm. Na, ne ko ez dipeyvîm, min xwe dixist dewsa kes û  
şênîyên  
ko di sûretan de, bi libas, tevger, awir nêrîn ên cihê dixuyan. Carina  
ez  
dibûm leşkerek û mîna leşkerekî diqîriyam, carina dibûm kalepîrekî  
bi  
gopal û min lawij dixwendin, carina dibûm qumanderek û ferman  
dibarandin, carina dibûm pîrejinek û stran dinehwirandin, carina jî  
ez  
dibûm şaîrek û min, mîna dengbêjekî, gotin li pey hev rêz dikirin.  
Her  
kesekî bi dengêkî, her tevgerêkî bi şêweyekî û her dengêkî jî bi



meqameke xas. Li gora min, bi qasî ko min ji şerhên mamosteyan û  
sûre-  
tan fahm kiribû, dengê Keso mîna pola sert bû, ko kevir jî dibirî,  
dengê  
Naso mîna qedîfe nerm bû, ko ruhê herî şêt jî haş dikir, dengê Maro  
jî  
mîna dengê ava çemê Dîcleyê bû, ko carina bilind, carina aram, her  
û her  
diherikî.  
Herwekî kitaban, di nav sûretan de jî, nemaze hin sûret li ber dilê  
min,  
bêtir, ezîz bûn. Di Tewratê de, di yek ji rûpelên pêşîn ên kitaba  
yekemîn  
a Mûsa Pêxember de, sûreteki gelekî spehî hebû, ko çemê Dicle û  
Firatê,  
bi hemû zelalî û bedewî nîşan dida. Herçiqaş, piştî ko ez pêrgî Stêrê  
ha-  
tim, hejmara sûretên Tewratê ko li ber dile min ezîz bûn, zahftir  
bûn, lê  
belê hingê, di kitabxanê de ew sûretê ko çemên qedîm ên  
însaniyetê  
berpêşî min dikirin, hem heyecaneke boş dida min, hem jî  
sikûneteke  
kûr. Ma kî dizane, heye ko destpêka strana min a Dîcleyê jî, hingê,  
ji nav  
rûpelên Tewratê, kahniya serpêhatiyên Firat û Dîcleyê, derhat? Di  
kita-  
ba Keso de ew sûretê ko Mam Sefo nîşanî min dabû, ko tê de bav û  
kalên  
min, ên Mam Sefo û yewnan ko paşê, piştî sirgûna me, ew ê bibûna  
heval  
û hogirên heyat û qedera min, bi qîreqîrên şer û pevçûnan, li hev  
dini-

hêrin, hertim bala min dikêşand. Kardûx, ermen, yewnan, çek û pûsad,

qîrîn, gazîn, hawar, mirin, kuştin, tirs, revîn, di wî sûretî de ev hemû, bi

hêsanî û bi zelaî, dixuyan.

Di kitaba Naso de, sûretek ko tê de kalemêrekî ko Naso bixwe bû, li qiraxên deryayeke bi pêlên tarî harbûyî, li ser zinarekî rûniştibû û bi keser, bi xizîn, li derya reş, pêlên tarî, ewrên girtî dinihêrî, gelekî bala

min dikêşand. Heye ko hê hingê, çaxa min, car bi car li sûret nihêrîbû,

bêyî ko haya min jê hebe, çavê min ê kor, mîna her cara mûsîbet,

86

jeniyabû û min bîr bi qedera we ya welatê xerîbiyê ko gelekî bi qedera

Naso dişibiya, biribû.

Herçî kitaba Maro bû, dîsan di rûpelên pêşîn ên kitabê de sûretekî ko

eceb xweşik, na ne xweşik, zîz hebû, ko bêpayan bala min dikêşand; di

sûret de, li pêşî, qehremanekî bejndirêj, birîh û çeleng, zarokekî li pişta

wî, şûr di destan de, li teniştta wî jî jinikeke ciwan a bedew, kalemêrekî

veciniqî û hin kesên din ên bi cil û bergên şewitî û lîmêbûyî, bi hev re

dimeşyan, li pey wan jî bajarê ko tevî birc, beden, xanî û avahiyên xwe di

nav gulokên êgir de bû, dixuya. Qehremanê me, tevî jin, zarok, bav û

nasên xwe, axa bav û kalên xwe yên mirî, bajarê xwe yê şewitî, heval û

dostên xwe yên kuştî, jin û zarokên nasên xwe yên dîlketî li pey xwe di-

hişt û diket ber pêlên welatê xerîbiyê, mîna ko me dê jî, piştî têkçûna ser-

hildana Mîr, bikira...

Û di kitaba Maro de, bi xêra mamosteyên Migo, ez hînî cimla xwe ya

yekemîn û dawîn a latînî jî bûm: Arma, virumque cano.

Yanî; ez strana sîleh û însanan dibêjim...

Dengê bêdengiyê, gelek caran, ji dengê sîlehên ko bi dengê xwe yê ecêb

hemû dangan ji holê radike, tê pê. Belê, dengê sîlehan, dengê şûr, dengê

tivingê, dengê topan, dengên ko dengê însên dikuje û hawîrdor diqulipîne ser çoleke bêdeng.

Bêdengî, west e,

Heke ne west be, keser e,

Heke ne keser be, hesret e,

Heke ne hesret be, jan e,

Heke ne jan be, bîr û heş e.

Yan jî ev hemû ne.

Yan jî hin ji van in.

Mîna niha,

Mîna ko ez niha dikim, bi qesta bîhnvedan û cixare pêçanê radiwestim û dikevim nav pêlên bêdengiyê.

Na, ez nakevim nav pêlên bêdengiyê,

Pêlên bêdengiya dewr û dewranên windabûyî û jibirbûyî bi ser min de tên...

Deng, di berbangeke çîkî zelal a heyameke zahf kevn de deng.

87

Ronahî, gewherî.

Di pey tarîtiya şevê re ronahî.

Ronahiya ko çêla stranên kevnare ye,

Ronahiya ko li ser her tîrêja wê, her tevgera wê stranên  
abadîn lêbûne.

Heyamek û rojeke weha ya stranan.

Taveke gewher ko li ser sînga çiyayê Şengalê leylan dide.

Tîrêjên ronî ko di nav pel û çeçilên darên kêleka çemê  
zelal re diseridin.

Çîrûskên ronî ko li ser ava kahnî direqisin.

Şewqên rengîn ko li ser dîwarên ji kevirên reş ên xaniyên  
gund dibiriqin.

Dinya aram, sakîn, ronî.

Lê deng, dengên xofê:

Allah, Allah, Allah...

Allah, Allah, Allah...

Saw, tirs, dengê qiyametê,

Pêla dangan, dengê simên hespan,

Dengê hîrîna hespan,

Dengê qîrîna siwaran.

Gav bi gav nêzîktir.

Gav bi gav ji aramî û sikûnetê dûrtir.

Û deng, dengê tirsîyan.

Teyr û tilûr, bi bask û perwazan, dûr bi dûr.

Dîk û mirîşk, bi tiralî, geh li vî alî, geh li wî alî.

Hesp û mehîn, bi hîrîn û hîşîn, revîn, revîn.

Cahnî, pez, dewar, ker, bergîr, revîn, revîn.

Însan, zar û zêç, kal û pîr, jin û mêr.

Xwe veşartin, revîn, revîn.

Lê ewana, dengê wan;

Allah, Allah, Allah...

Allah, Allah, Allah...

Dengê tekbîrên wan.

Dengê şûrê wan.

88

Qîrîna ko aramiya destê sibê diqelişîne.

Dengê ko bêdengiya îsanî ya şefaqê têk dibe.  
Lê ewana, dengê wan.  
Di nava meydana gund de.  
Li ber dîwarên malan.  
Li ber deriyan.  
Li ber deriyê ko niha, tevî mij û dûmana dewr û dewranan,  
di nav mij û dûmane de bi bîr tê.  
Li malekê ji malên gund, li milê êxur, pênc kes, sê zarok,  
bav û dê.  
Bav û du zarok, keçek û kurek, li êxur, di nav pêz de.  
Dê û zarokek, kurekî ko hê jê bîhna şîr tê, di kadînê de.  
Bêdengî, bêdengiya tirs û sawê.  
Bêdengiya tirs û şûr, tirs û mirinê.  
Kadîn, zarok di hembêza germ a dê de.  
Dê, tirs, cirifîn.  
Zarok, girîn, lerizîn.  
Megirî kurê min, megirî, megirî.  
Girîn.  
Destê nerm ê dê, pihêt, li ser devê zarok.  
Megirî, megirî, megirî lawê min ê delal...  
Lê ewana, dengê wan.  
Xerîb, ecêb.  
Dengê ruhistîn.  
Nêzîktir, li hundir. Li milê malê...  
Qîrîn, şerqîn, pîrqîn.  
Bêrawest, bi qasî çendekê.  
Çendek ko bi qasî babilîskekê dirêj, bêdawîn.  
Deng, dengê deriyê êxur.  
Û dengê zarok, dengê keçikê;  
Bavo, Bavo, Bavo,  
Yadê, Yadê, Yadê.  
Dengê pêz, berx, mîh.  
Dengê kur, keç, bav.

89

Û dengê wan, carek, du caran, sê caran.

Car bi car.

Û dengê şûr, carek, du caran, sê caran.

Car bi car.

Qîrîn, axîn.

Birîn.

Û mirin, bêdengiya li pey mirinê.

Bêdengiya ko li pey dilopên xwînê yên devê şûr tê pê.

Bi qasî çendekê ko bi qasî babilîskekê ye.

Bi dû re dîsan deng, dengê wan.

Nezîktir. Li nik kadînê.

Megirî kurê min, megirî, megirî.

Dest, bêgav, li ser devê zarok,

Çav şil, beden bi taya tirsê ketî.

Çend serî li ser dîwarê kadînê.

Qîrîn, qirîna wan.

Qîrîn, qirîna zarok û dê.

Û şûr, dengê şûr.

Geh li jor, geh li jêr.

Carek, du caran, se caran.

Car bi car.

Axîn, xwîn.

Xwîna ko ji devê şûr dilop dike.

Û çûyin, çûyina zarok û dê.

Çûyina wan, şûrbazên xwînxwar.

Û bêdengî, bêdengiya boş a mirinê...

Dengê bêyom ê şer û pevçûnê, di umrê min ê xeşîm ê zaroktî û xortiyê

de, tevî ko heyam aram, dinya ronî û wext hêvîdar bû, hertim, mîna şûrê

xwinrêjan, li ser milê me, hilawestîbû. Me hertim, bi gelek hêncet û şêweyan, bîr bi dengê şer dibir, em hertim pê dihesiyan.

Niha, di vê şeva me ya westiyayî de, her tişt çiqas aram, çiqas bêdeng e!

Guhê xwe bidin ser dengan... ji dengê min ê kal û birîndar, ji dengê çemê

Dicle yê abadîn û herikbar, ji dengê bayê sivik ê hûnik û evîndar pê ve çu

deng hene? Na, nîn e. Lê hûn, dengê heyamên bê, divê baş bi vê yekê

bizanibin; dengê min jî, dengê Dicle û dengê ba jî, di esasê xwe de, regekî dengê şer e, tê de dengên têkel ên şer heye. Dengê şer...

kîn, ne-

90

fret, berberî, çavsorî... şûr, xencer, tiving, top, hilweşîn, şewat, xwîn,

birîn, axîn, qîrîn, hawar... mirin, windabûn, veqetîn, koç, hesret... şer,

yanî birîn, birînên mêjî û dil, birînên însan û civatan ko çu carê nacebirin... Şer, yanî şopa kûr a birînan li rûyê însanan, li ruhê civatan, li kûrahiya wîcdan û merhameta dewr û dewranan. Bila ev aramî û sikûnet

we nexapîne, beriya vê aramiyê şer hebû, tirs min, ew tirs e ko piştî vê jî

dê dîsan şer hebe. Hûn werin, dengê şer û pevçûnan, ji tecrubeyan, yanî

ji dengê min, dengê Dicleyê û dengê bayê destê sibehê bipirsin.

Heyata min ko di navbera Medresa Sor û kitabxana Mam Sefo, gotina

devkî û gotina niviskî, mala Apê Xelef û mezelên Medresê, Armê û Gulîzerê de dibihurî, mîna kulîlkên sor ên xwînî yên hinaran ko di

biha-

ran de dibişkivin, roj bi roj, geştir û xweştir dibû. Wext diherikî, heyam

diçûn, sal dibihurîn û heyata min, bi rûpelên nû yê ders û  
tecrubeyên  
heyatê ko di nav rûpelên kitabên de veşartîbûn, dewlemendtir  
dibû. Lê  
belê hema çî bigire, hemû tiştên ko ez hîn dibûm, li ser şer, pevçûn,  
evîn,  
hesret, jan û hêviyê bûn. Medrese, warê evîna manewî, kitabxane,  
warê  
evîna nefsi; gotina devkî, warê xewn û xeyalan, gotina niviskî, warê  
hesab  
û kitabên bû. Li Medresê, di destê sibehan yan jî di nîve şevan de,  
geh li  
dersxanê, geh li hicrê, geh li nik tirba Melayê Cizîrî, pirî caran  
kitabek ji  
kitabên dersxanê di destê min de, rêzên kitabekê yan jî yê  
çîrokeke mî-  
na Hezar û Şevkê li ser lêvên min, heşê min li dûr, di nav kûrahiyên  
manewî yê heyata piştî vê heyatê, ez ji xwe ve diçûm. Li kitabxanê,  
danê  
êvaran yan jî derengê şevan, geh li erdê, li ser xalîçe û mehfûran,  
geh li ser  
dîwanê, dirêjbûyî, di bin ronahiya qendîlan de, çavê min pirî caran  
li ser  
teyrê tawis ê dîwêr, guhê min li ser dengê ava Dîcleyê, hertim kitab  
û  
rûpel û di nav rûpelan de jî sûret û bergeh li ber min, dilê min bi be-  
dewiya sûret û bergehên keldayî, heşê min li ser xêz, kes û şeklên  
ko di  
nav bergehên de dixuyan, bi dengê bilind, geh bi qîrîn, geh bi  
gazîn,  
geh bi olan, geh bi liyan, min însanên bergehên vedijandin û ruh û  
dengê dida wan.  
Ez dibûm Naso û min li welatekî xerîb, li nik însanên xerîb ko bi zi-



manekî xerîb diaxivîn, ji rêz û rêzdar, hez û hezkarên xwe dûr,  
jibîrbûyî

û di nav tenêtiyeke bêpayan de, bi dengê xemgîn û zîz, bi keser û  
hes-

ret, deng li derya xerîb û tarî ya xopan dikir.

Ez dibûm lehengê Maro, barê min giran, stûyê min xwar, welatê  
min ê

şewitî û heval, nas û xizmên min ên kuştî li pey min, hevala min a  
heyatê

winda, bav û kurê min westiyayî û dilşikestî, şûr di destê min de,  
dilê min

91

bi mirin, kuştin û ketinê guvaştî, mîna dizekî, bêdeng, tevî heval û  
hogirên min ên şerê man û nemanê, bi xwestek û hedefa dilopeke  
hêvî û

çilkeke ronahî, ez li keştiyan siwar dibûm, min ji ava kesk a derya  
zelal

lenger digirt û carina bi qîrîn, carina bi girîn, birîndar, min berê xwe  
di-

da welatên xerîb û nediyar, warê însanên ko ne mêvanperwer bûn  
û ne jî

dildar.

Herçî Keso bû, jixwe ew, ez bûm. Çaxa min rûpelên zerbûyî yên kita-  
ba qalind û mezin a Keso vedikir û li sûretan dinihêrî, taviê, ez,  
carina,

diqulipîm ser lehengekî tarîxî ko di sûret û bergehên kitabê de  
dixuya, ca-

rîna jî ez dibûm kumandarekî serfiraz, alîmekî bîrbir, zanayekî  
dûrbîn û

leşkerekî jîr û min bi qîreqîr, bi xirecir, geh siwar, geh peya, geh bi  
çek û

zirx, geh rût û pêxwas, geh li çolên germ ên çikî zuha, geh li newalên  
kûr

ên çiyayên bilind, pêlên çemê Dîcleyê, bilindahiyên çiyayê Şengalê,  
bir-  
cên welatê Babîlê, deriyên qehîm ên keleha Nînovayê, çiyayên asê  
yên  
welatê med û kardûxan, zozanên welatê ermenan, ava har a Derya  
Reş û  
gelek cîh, war, welat û qonaxên din, bi leza birûskê, bi sivikahiya  
perê  
teyrê tawis, di bîhnekê de dibirîn û min bûyerên ko bergehên kitabê  
berpêş dikirin, werdigirtin û ew diqulipandin ser wê heyama min a  
xor-  
tiyê ko jê bîhna geşbûnê difûriya; hin ji kesên bergehên ko di nav  
berfê  
de diqerisîn, dibûn osmanî, hinên din ko tî, birçî, westiyayî, lêv û hi-  
narikên wan terikî, dibûn kurd, hinên din ko di nav mij û dûmanê  
de,  
rêwindayî, li riyekê digeriyan, dibûn ermen, mîr û mîrzayên  
bergehên ko  
bi dek û dolab, bi şer û pevçûn gora hevûdu dikolan, dibûn mîrên  
Cizîra  
Botan, Hekaran, Mikus û Serhedan û her yek dibû xwediyê dengê,  
dengê xas ko min li gora helwest û rawestîna wan a sûretan, li  
gora xwe,  
diafirand û vedijand.  
Gotineke kurdan heye, dibêjin, sî û sê çîrokên hirçê hene, hemû jî li  
ser  
hirmiyê ne. Heyata min jî welê bû; roj, hefte, meh, sal bi çîrok,  
mesel, ef-  
sane, şîr, serpêhatî, lawij, rêz, hedîs, ayet, gotin û kitabên ko li ser  
şer,  
pevçûn, veqetîn, xizîn û keserê bûn, derbas dibûn. Heke hûn niha  
bipirsin, ka ez ji van hemûyan ko ne bi tenê neqşên heyata min,  
herweha

hê jî birîn û keserên ruh û dile min in, çi hîn bûm, ez ê, piştî evçend  
qe-  
da û belayên ko bi ser me de hatine, ji we re bibêjim ko li cîhanê her  
tişt,  
însan, teyr, tûr, dar, nebat, her celeb mehlûqat, mehkûmî mirinê  
ne, lê  
heke hûn bixwazin tişteki, îsanek, bûyere, serpehatiyek,  
pewendiyek,  
hisek, daxwazek, bikin nemir, hingê hûn divê xwe bispêrin gotinê,  
ger  
gotina devki, ger ya niviski û jê bir û heşeki qehim binin pe, – bir û  
heşeki

92

qehim ko rê li windabûn, jibirbûyîn û tekçûnê bigire û nehêle wexta  
kambax ko her diherike, bi pêlên xwe, her tiştî bifetisîne.  
Belê, ji ders û tecrubeyên gotinan a heyata xwe, ez dikarim, bi kurtî,  
vî  
tiştî ji we re bibêjim; herweki ko di destpeka Tewratê de hatiye  
gotin,  
beriya her tiştî gotin hebû, bi gotinê, afirîna herî hêja ya însanan,  
her tişt  
afirî; ji lewre pe bawer bin, çu carê rû ji gotinê banedin, lê hûr bin,  
baw-  
erî hem bi gotina Tewratê binin, hem bi telqînên êzidiyan, hem bi  
ya  
çirok û efsanan, hem bi ya bûyer û serpehatiyên; xwe bigihînin  
cewhera  
gotinê û rê bidin ko bila gotin jî xwe bigihîne ruh û canê we; li gotin  
û ce-  
whera wê bifikirin û wê vejînin, dengê bidinê, bi ruh û canê nû  
wê  
bixemilînin, gotina bêruh ko hûn dibînin, an jî dibihîzin, biqulipînin  
ser

heyineke zindî, bila ew bijî; heke hûn pêrgî gotinên tewş, pûç an jî  
vajî  
tên, rû ji wan bamedin, dewsa ko hûn yekê qebûl û ya din jî red  
bikin, bi  
hewldan û xîret, wan li hev bînin û ji wan dewlemendiyeke nû bînin  
pê,  
wan paqij bikin, zelaliyeke germ û samimiyeteke dilsoz bidin wan, ji  
bîr  
mekin ko her gotin li gora ihtiyac, daxwaz û mirazeke însanî hatiye  
afirîn  
û li cîhanê ne bi tenê daxwazek heye, ne jî ihtiyac û mirazek, ev  
hemû za-  
hf in, têkel in û pirî caran jî li dijî hev in, lê heke hûn hostayê gotinê  
ne,  
hingê, bi xîreta zêrîngerekî wan bihûnin, bineqîşînin û li hev bînin;  
goti-  
na Memê Alan, an jî ya Zîna Zêdan li gora dewr û dewran, rabûn û  
rûniştin, cil û bergên Mem û Zînê bipîvin û herçi ya Bekoyê Ewan e,  
wê  
jî, bi cil û bergên nû, mîna ders û tecrubeyeke însanî, berpêşê  
guhdarê  
xwe bikin...  
Aha kurtebiriya heyata min; gotina însanî û şerên neînsanî ko bi  
destê  
însanan tê pê, yanî bi qewlê Maro, însan û çek û vegotina wan...  
Kengî ez bi dengê bêyowm ê şer û pevçûnan hesiyam? Bêguman  
gelek  
kitekit di heşê min ko ji kitekitan westiyayî de hene, lê belê, heke ez  
ne şaş  
bim, cara yekemîn, di wê roja pîroz a eydiya qurbanê ya misilmanan  
de,  
ez bi xurtî, bi dengê şer û pevçûnan hesiyam. Hingê êdî umrê min  
qon-

axên destpêkê birîbû, min bîr bi çerxa felekê, kar û şixulên dinya û  
mîrekiya Cizîra Botanê dibir, hefteyek, du heftan carekê bi  
cûzaneke ko

rîh û simbêlên ko bi şermokî nexşeyeke nû li ser rûyê min dianîn pê,  
jêdikir, bi dengê xwe ko êdî ber bi qertbûnê ve diçû, stranên nû ko  
mîna

xwediyê xwe qonaxa zaroktiyê li pey xwe hîştibûn û çêla heyata  
Dîcleyê

dikirin, li hev dianîn û mîna rojên xortiya Apê Xelef, min jî xeyal li  
firkandina ten û canên nermik û germahiya memikên gewher dikir.

Tevî

ko min qonaxa şagirtiyê jî birîbû, ez hê, bêyî ko bixwazim bibim feqe  
û

93

mele an jî alîmekî dîndar, li Medresa ko mîna mîrekiyê, roj bi roj  
dibû

navendeke gelekî girîng, dimam.

Min û hevalên min, me hemûyan bejn avêtibû; gewdê min girs,  
bejna

min dirêj bûbû. Hemeyê tirek, bi bejna xwe ya dirêj û zirav ketibû  
rewşeke welê ko êdî tirek û deh tir li ba wî mîna hev bû, Migoyê  
Hûro,

bi xwarin û goştê ko wî bi şev û roj dadîqultand, bûbû mîna  
conegayekî

bitirbûyî, Gûlîzer, bi bejn û bala xwe ya şox û bi memikên xwe yên  
mîna

du portaqalên Derya Spî bûbû dareke behîvan a biharê ko pel û şax  
dide

û herçî Armê bû, wê jî bejn avetibû, lê her welê mîna diya xwe, jar  
û

merezî mabû. Gelek kesên din, ji Cizîrê û der û dorên Cizîrê, gundî,  
ba-

jarî, kurên axa û began, gavan û cotkaran li civata me zêde bûbûn,  
lê ji  
wan dudo êdî bûbûn hevalbendên esasî yên koma me ya tiredînan;  
Têlî  
û Yezdînşêr.  
Têlî ko ji min bi qasî çend salan biçûktir, ji herdu çavan kor û pozber-  
anekî bi dilê we bû û li Medresa biçûk a qesra Mîr, li ber destê  
seydayên  
bijarte Quran û dersan hefiz dikir, kurê Mîr bû. Yezdînşêr ko ji min  
bi  
qasî du salan biçûktir, lê bi gewdê bi qasî min, xortekî çeleng û  
lihevhatî,  
rûgeş û jîr, biraziyê Mîr bû. Yezdînşêr ko du salan bi dû min re, li  
Medresa Sor, dest bi xwendinê kiribû, kurê Mîr Seyfedîn û xwarziyê  
Seîd  
Begê bû. Seyfedîn Beg, beriya Mîr û birayê Mîr Salih Begê, mîrê  
Cizîra  
Botanê bû û Seîd Beg jî serekê keleha Gurkêlê bû. Di şevbuhêrkên  
bê de,  
heke Yezdanê dilovan jî dil bike û heta hingê nefesa min neçikîne,  
ez ê  
çêla Seyfedîn Beg, Seîd Beg û keleha Gurkêlê ko qulipî ser qada şer  
û  
birîneke kûr di dilê welatê Cizîra Botanê de veda û nexweşiyên kûr  
anin  
pê, bikim.  
Herçî Heme bû, ewî jî, mîna Yezdînşêr, du salan bi dû min re, heye  
ko  
ji hesûdî û zikreşiya li hember min, li Medresa Sor, dest bi xwendinê  
kiribû û tevî ko ew kurê Xelefê êzidî bû, li ser riya melatî û îlmê  
îslamiyetê  
pêngav bi pêngav pêş diket.  
Ew roja ko niha tê bîra min, em herpênc heval li nik hevûdu, li qesrê,

li şaneşîna Mîr bûn. Di bihareke germ de, ko êdî darên bihîvan  
kulîlkên  
xwe yên spî diweşandin û darên hinaran kulîlkên xwe yên sor diquli-  
pandin ser hinarên biçûk, rojeke germ a çarê eydiya qurbanê bû û  
dinya  
êdî êvar bû. Rojeke tijî kêf û şahî li pey mabû, tevî ko dinya hê jî bi  
ron-  
ahiyêke qels a çikî sor xemilandîbû, êdî çirûsken stêran li ser  
gopikên  
çiyayê Cûdî dixuyan. Roja dawîn a cejnê bû, heciyên ko li ser riya  
Mekeyê bûn û her sal dihatin li xan û malên Cizîrê mêvan dibûn,  
niha li  
94  
axa pîroz a misilmanan bûn, zarokên ko li hêviya cejnê bûn, çar  
rojan, bi  
bexîş, yadîgarî, lîstik û şahî û şênahiyan westiyabûn, tifikên mitbax  
û  
aşxaneyên qesra Mîr ko di nav wan çar rojan de hertim jê dû û  
dûman  
bilind dibû, êdî vemirîbûn û mizgeft û medresên bajêr ko tijî însan  
bûn,  
vala bûbûn. Mêvanên dawîn ên qesrê ko hemû giregirên welêt bûn,  
piştî  
xwarina şîva êvarê, ko ji xwarinên bijarte yên Cizîra Botan, kutlikên  
mêlakê, savara kerengê, çend celeb meftûnî, meftûneya dîzikê,  
bamyê,  
bacanê sor û reş, qelî, selateyên sevze, mastî, xamîne û bi dû şîvê  
re jî, şîrî-  
nahiyên kulindê dimsê, qelezeng û tîllokê hatibû pê, bi qewlê  
gotina  
kurdî, ji dinyayê re nan, ji axretê re îman, xatir ji Mîr û qesrê  
dixwestin û

li hespên xwe siwar dibûn û diçûn. Bi dehan, heye ko bi sedan xizmetkar  
û qewraşên qesrê li bexçê qesrê û li bexçeyên fireh ko di navbera dîwarên  
bilind ên qesrê û qiraxên çem de hêşîn dikirin, kelepûr û gemariya ko  
şênîyên Cizîrê li pey xwe hîştibûn, dixistin telîsan û riyên biçûk ên bexçeyan dimalaştin.  
Em li jor, li şaneşîna fireh a qesrê ko ji kevirên şehkirî yên reş ên çiyayê  
Cûdî hatibû raxistin, peregende, bi şîva êvarê ya lezîz û keft û lefta çar ro-  
jên bi şahî westiyayî, li ser piyan bûn. Mîr, bira û biraziyên Mîr, Mam Sefo, pispor, şewirmend, weznedar, seresker, mela û seydayên Mîr li milê  
din ê qesrê, li aliyê Birca Belek, li meclîsa tenîştî Bircê bûn. Têlî ko kurê  
herî mezin ê Mîr bû û gelekî dişîbiya Mîr, li nik min bû û min jê re çêla  
stêrên ko hedî hedî hildihatin û diçirûsîn, dikir. Tevî ko Mirê Zirav hê  
gelekî xort bû, ji niha ve hejmara zarokên wî gihîştibûn şeş heftan. Mîrê  
me ne bi tenê hosteyê gerandina şixulên mîrekiyê bû, herweha ew hosteyê piştî xwe bû jî; roj bi roj hejmara jin, cariyê û zarokên wî zêde  
dibûn. Sê kurên wî yên mezin hebûn, Têlî, Necîb û Elî Şamil, lê ji wan Têlî, heye ko ji ber korahiya wî yan jî bêdengiya wî, bûbû hevalê min.  
Me, min û Têlî, du kesan bi çavekî, hevaltiyeke qehîm ko ew ê her û her  
dewam bikira, anîbû pê. Herçî Migo, Heme û Yezdînşêr bûn, ew jî li aliyê din ê şaneşînê bûn û bi xirecir di navbera xwe de dipeyvîn.



Ava Dîcleyê, bi hêza barana biharê, bi dengekî xurt, mîna lehiyekê,  
pi-  
hêt, ahengdar û têkûz, diherikî. Tevî ko êvarê hê nû dest pê kiribû,  
heyveke ronî ya nûger hatibû û li ser bilindahiyên çiyayê Cûdî  
hilawest-  
îbû. Heyv, eynî mîna heyva ko di Mishefa Reş a êzidiyan de çêl lê  
dibû,  
bû; ronî, nûranî, spehî û abadîn. Ê tiştê herî xweş jî, heyv û stêran  
huzmeyerke ronahiyê ya bêpayan li ser rûyê avê anîbûn pê. Min li  
milekî  
ji Têliyê ko ji nûra çavan bêpar bû re, qala nûraniya heyfê û stêran  
dikir  
95  
û li milekî jî car bi car, mîna ko ez li ber xwe bipeyvim, weha digot,  
Stran divê, Teliyê bira, stran.  
Têlî jî, ji gotinên min ên li ser stranê eciz, de bibêje Biro lo, de bibêje,  
digot.  
No, Têlî no, min lê vedigerand, ez ê stran nebêjim, ez ê lêkim...  
Lê êvara me bi wê kêfxweşiya êvara ronî û aram a eydiya biratî û  
xweşiyê kuta nebû. Hê ez û Têlî, guhê me li ser dengê Dîcleyê, bi  
gotinên  
tewş, dipeyivîn, li milê din ê şaneşînê qîrînek bilind bû. Migo, Heme  
û  
Yezdînşêr bi dest, pî û gurmistan ketibûn hev. Çima, sebeb çibû, kê  
li kê  
dida, me nizanîbû, lê gava em gihîştin nik wan û me, bi alîkariya hin  
berdestên qesrê ko xwe gîhandibûn şaneşînê, ew ji hev veqetandin,  
min  
dît ko ji bêvil, birûyê çavê rastê û eniya Migo xwîn dihat. Hersê jî  
mîna  
deveyê hêç har bûbûn û bi qîreqîr tiştine kirêt ji hev re digotin. Ez,  
Telî

û du berdest li nik Migo man da ko wî haş bikin, çendên din jî Heme  
û

Yezdînşêr ji wir bi dûr xistin. Lê çaxa ew ji şaneşînê bi dûr ketin,  
gotinên

ko ji devê Hemeyê tiredîn, bi qîreqîr derketin, ko tê de hem tovên  
fe-

laketên rojên bê û hem jî dengê şer û pevçûnên dîn, gel û welatan  
hebûn,

çu carê ji bîra min neçûn. Her cara ko mûsîbetek hate serê me, ew  
gotin

jî, car bi car, hatin bîra min. Niha, piştî umrekî, gava ez behsa wan  
dikim,

mîna ko ew hê nû, dîsan, ji devê Heme derdikevin û ruhê min digu-  
vişînin;

File, kurê filehan... neynûk file... ho, ehlê Cizîrê, hespê kule, seyê  
tûle

û kesê file, lê mebe ewle, gelî Botiyan, lê mebe ewle...

Dengê strana Dîcleyê di mehên biharê de, ko hingê çem dibe lehî,  
xurt

1. Ne bi tenê di mehên biharê de, herweha gava hestên hêrs,  
kerb û hîde-

tê li dar in, dengê stranê dîsan xurt e. Xurtahiya deng, ji hişyarbûna  
tebiyetê û serhildana hîs û pejnan e. Weha;

Dîcle me ez,

Dengê Dîcleyê,

Qîrîna ko olan dide,

Hawara ko bang dike,

Strana ko dibêje.

Li ser rûye min şopa şûr, rim,

Rengê derd û keseran,

96

Pêjna miriyan,

Şer, pevçûn, veqetîn, talan.

Di nav şikêrên zinaran de dizêm,  
Di nav boşahiyên deryayeke aram de têk derim.  
Ez dizêm, bayê gur, zozan, berfa spî,  
Arzû, coş, evîn,  
Ez dimirim, bayê germ, çol, ne starî, ne sî.  
Valahî, bêdengî, sakîn,  
Li ser rûyê min kelek, keştî, mîna hêstirên çavan,  
Siya darê çinaran, bî û spîndaran, mîna şopên derketiyan.  
Ho tu, dengê qîrîna însaniyetê,  
Dengê hawara însaniyetê.  
Guh bide min, dengê min, dengê Cizîra Botanê.  
Cizîra Botan, kurê Cûdî, neviyê Nuh,  
Milekî li çiya û zozanan  
Milekî ber bi çol û deryayan.  
Asiman, ro, stêr, heyv, heyveron qedîm, qehîm,  
Şahidên rûyê min, şopên li ser rûyê min,  
Dinihwirînin lorîna keserê,  
Difirkînin rûyê min ê birîndar  
Li qiraxên min teyr û tilûr,  
Eylo, baz, başoke,  
Legleg, quling, teyrê tawis, bi rengên keskesorê.  
Keskesoreke abadîn geh li pêsîra asiman, geh li ser rûyê min.  
Ez diherikim, ji do ber bi îro,  
Ji dengê xurt ê coşê ber bi dengê bêdengiyê.  
Cizîra Botan, mercana jorîn a Mezopotamyayê.  
Tê de hestên xurt, bestên kûr veşartî,  
Gotinên delal, kelimên zelal, ji do ber bi îro,  
Veguhastî, mîna lehî.  
Siwarên hespên seglavî mîna lehî,  
Ewrên bi baranê avis mîna lehî,  
Refê qulingan mîna lehî,  
Kevir û zinarên reş ên Cûdiyê, mîna lehî,

Tovê ko hêşîn tê, mîna lehî,  
Simbilên ko serî radikin, mîna lehî,  
Gotina ko tevî min diherike, mîna lehî,  
Û ez, şopa însaniyetê mîna lehî.  
Ho tu, qîrîna însaniyetê,  
Dengê hawara însaniyetê,  
Guh bide min; Dîcle me ez,  
Dengê strana Dîcleyê,  
Zimanê bêzimanan, dengê bêdeng...

98

ŞEVBUHÊRK SISÊ

ro

Dengê min yanî dengê Biroyê dengbêj ko hûn ê îşev jî seh bikin,  
dengê

Dîcleya xopan, Firatê malikwêran, Nînovaya şewitî û Babîla  
hilweşiyayî

ye.

Êvareke nû ya heyameke kevn a jan, keser, hesret û mirinê tê; siya  
êvarê

ko remzeke kevn a çerxa dinyayê ye, hêdî hêdî hawîrdor radipêçe û  
tê;

gotinên vê êvara nû ko ji dewr û dewranên bav û kalan mane, yek  
bi yek,

xwe li ba dikin û tên û hûn, guhdarên vê êvara nû, xwediyan  
şevbuhêrka

nû ko dê bi meraq li gotinên bav û kalan guhdarî bikin, bi evîni  
qefesa

dilê xwe ji deng û pejnên min, Biroyê dengbêj, kalemêrê li ber  
mirinê,

tiredîne pêncperan ê dinyayê re vekin, gav bi gav, nêzîki li min û li  
dengê

min dikin û tên.

De werin, hûn hemû bi hev re werin da ko em hemû bi hev re herin.

Em herin qiraxên çeman, bin darên wext û dewran, ber lingê sûr û  
bir-  
cên kelesan, gopikên girên hezar salan, kavlê bajaran, kûrahiya  
kele-  
porên medeniyetan, nik kalemêrên rîhspî yên êzidiyan, eywanên  
malên  
keldanan, deverên sazî yên bedewiyan, welatê êzidiyan,  
misilmanan, file-  
han. Em herin geşt û seyrana şevbuhêrka me ya nû û xwe bigihînin  
van  
hemû dangan.  
Belê, şevbuhêrka me dê îcar çêla deng, pêjn, reng û tahmên nû yên  
hey-  
ata min ko li derveyî welatê Cizîra Botan rabû govendê, bike. Lê pêşî  
xewnek... Xewnek ko min, çavê min vekirî, bi êşa xedar a birînên  
min,  
carina hişyar, carina jixweveçûyî, berî ko hûn werin, dît.  
Xewna min, mirina min bû, min di xewna xwe de mirina xwe dît.  
Herçiqas min di her gaveke nû ya heyata xwe de mirin dît, hertim  
ez  
pêrgî mirinê bûm û min mirina ko jê xelasî ne mimkun e, mîna  
perçeyekî  
esasî ya heyata xwe qebûl kir û gelek ezîzên xwe gorî axa reş kir, çu  
carê ez  
neketim goreke nûvekolayî ya goristaneke kevnar ko bi darên bî û  
spîn-  
daran warê aramî û sikûnetê ye. Lê di vê xewna min a nû de ez  
ketim  
gorê, goreke nû ko di bin siya dareke qedîm a tûyê de vedayî bû û  
jê bîh-  
99  
na axa reş a nû kolayî difûriya.  
Şev bû, dinya aram, hawîrdor çîksayî, asiman ronî bû. Şewqa

heyveroneke gewher û lîstikên ronî yên stêrên hezhezok şevê, kê  
zêde,  
qulipandibû ser rojê. Pêşî bi qasî çendekê ez li aliyê hundirê malê  
ko ji vê  
mala belengaz bêtir bi mezeleke qesreke mezin, mîna qesra Mîr  
dişibiya,  
li ber pencerê sekinîm û min li lîstikên stêran, kenê heyva ronî,  
xuşîna ava  
zelal û pelên darên li kêlekên çem ko yek bi yek hildiweşiyên û mîna  
çirûskeke zer ko di nav reşahiya tenik a şevê de dibiriqîn,  
hildiweşiyên,  
nihêrî. Welê dixuya ko tebiyetê dîsan kirasê xwe diguherand, pel di-  
weşiyên, dar serqot diman, çiya bi hatina berfê şaşikeke spî  
dikêşand serê  
xwe. Mîna ko pel li ber min rabûbin govendê, ew hêdî hêdî ji çeqilên  
daran vediqetiyên, li hewayê çiv didan xwe, bi qasî kêliyêkê dizivirîn  
û  
diweşiyên erdê.  
Ma heyat jî ne weha bû? Ez, çavê min li ser govenda pelan, di xewna  
xwe de fikirîm. Gava wext tê, heyata insanekî ji dara jîndar a  
însaniyetê  
vediqete û diweşe erdê. Heyata pelan kuta dibe, heyata daran  
dewam  
dike da ko dîsan, bihareke din a bê, pelan bibişkovîne.  
Di heşê min de fikr û pirsên weha, sergêj, westiyayî û hinekî  
bîhteng,  
bi hedîka min derî vekir û ez derketim derve. Bi tena kiras û derpiyê  
spî,  
lê kulavekî qehîm a şivanan li ser milên min û cixareyeke pêçayî û  
heste  
di destê min de. Dinya hinekî hûnik bû, xunav ketibû erdê û bayekî  
sivik

pišta der û ber, dar û pelên ko êdî reng guherandibûn, hêdîka, mist dida.

Ez çûm ber çêm, çemê qedîm ê Dîcleyê ko hertim bi şêweyekî bi me re

ye û niha jî dengê wî li ber guhê me dikeve. Di bin dareke çinarê de ko

çend gavan ji çêm bi dûr bû û gewdê wê bi qasî birceke keleha Cizîrê stûr

bû, ez li ser totikan rûniştim. Min cixare pêxist, jê çend hilmên kûr kêşand, li dûmana wê ko gurz bi gurz bilind dibû nihêrî û guhê xwe da

ser dengê çêm, dengê ba û dengê sivik ê pelan.

Çem diherikî, av, bêrawest, ji welatên jor ber bi welatên jêr dixuşiya.

Ber bi derine, lê ber bi kû? Xuşexuşa avê çi digot, li pey wê xuşexuşê çi

deng hebûn? Çêm di zikê xwe de çi celeb deng vedişartin? Beriya min, kî

hatibû û li dengê çêm guhdarî kiribû, jê vexwaribû, tê de xwe şuştibû, tê

re derbas bûbû? Umrê dara çinarê çiqas bû? Kê ew çandibû? Wê şahidî li

çi û li kê kiribû? Çiqil û pelên wê ko niha bi bayê sivik diliviyên, beriya

min, ji kê re bûbûn dalde, bûbûn starî? Ê ba... ew ji kû dihat, bi kû de

diçû? Wî çi digot, çi distra, çêla çi dikir? Ê pel, pelên ko yek bi yek, bi

aheng, bi nazenîn diweşiyên. Remzê çi bûn ew? Umir? Wext? Heyam?

100

Însan? Roj? Hefte, meh? Sal, sedsal? Heye ko hemû?

Belê, hemû. Ma umir, wext, heyam, însan, roj, hefte, meh, sal û  
sedsal  
jî mîna van pelan, gava wextê wan dihat, nediweşiyar û piştî ko ew  
di-  
weşiyar, ma ew hemû bi bayê hûnîk ê berbangar, gav bi gav, bi  
wextê,  
nehatin ji bîr kirin?  
Piştî ko min cixara xwe kêşand, di bin dara çinarê de, di nav dengê  
çem,  
ba û pelan de, bîr û heşê min bi deng û pejnaran tijî, bi fikir û gumanan  
mî-  
na hêlekanekê geh li vir, geh li wir, ji nişka ve, ez ji xwe ve çûm û  
mirim.  
Çima, çawan? Ez pê nizamim, lê ez, bêyî ko biêşim, bi jan û keserekê  
bi-  
hesim, bêyî çu kul û bîrînê, bi aramî, bi hizûr mirim.  
Lê herwekî hûn dizanin, êzidî mirinê mîna dawiya heyatê nizanin,  
wan  
bawerî bi kirasguherînê heye. Beden dimire, ruh vediguheze  
bedeneke  
nû. Ruhekî pak û qenc xwe digihîne bedeneke pak, ruhekî kirêt û  
neqenc  
diqulibe ser ruhê heywanek an jî însanekî bêheş. Ez mirim, lê ruhê  
min  
hişyar bû, çavê min girtî, lê deriyên ruhê min vekirî bûn. Ehlê nas  
hatin  
ser min, feqîran Qewlê Îmanê li ser min xwendin, şêxê êzidiyan, bi  
be-  
ratê, ava çem, dilop bi dilop, xiste devê min û li rûyê min reşand, wî  
ez  
şuştim, cilên spî li min kirin. Ehlê min ê ezîz, nas û dostên min ên  
nêzîk



bi def, erbane û bilûrê, bi qewlê Mergê, bi terqîn û nasînê ez veşartim.

Ez hatim veşartin, lê hê dengê şêx û feqîran dihate guhê min;

Rojek ji rojan e

Werin xelkê arîfî zane

Ji mirinê bidin beyan e

Xelkê arîfî zane werin

Mirina ko beyan dibû, mirina min bû, lê ruhê ko lê liyan bû jî, ruhê min

bû; deng dihatin, min ew dibihîstin, deng û dengbêjî ji min bi dûr ketibû, lê ez bûbûm guhdarê dangan. Di nav regekî çik î spî yê gewher

de, bi nûreke tîj ko bi şewqa royê dişibiya, dengê ava çem, ba, dar, ber û

pelan ko tevî xwe bi sedan, bi hezaran dengên din jî dianîn, digihîştine

min. Dengên do, dengên pêr, dengê stran û serpêhatiyan, dengê ayet û

hedîsan, dengê şer û pevçûnan, dengê mîr û ordiyan, mêrkuj û bêbextan,

zarok û dayikan, dengê teyr û tilûran, rawir û direndeyan... Dengan her

tişt, çem, dar, pel, behr, aso, erd, asiman, însan, heywan, keleh, xanî,

deşt, gelî ser û binî hevûdu dikirin. Her tişt dikete nava hev...

Wext, eve bû; mekanekî bêserûber ko bi tenê ji dangan dihate pê.

101

Heyat, eve bû; dareke abadîn a çinarê ko ji pelên ko hertim dibişkovin û

diweşiyar, hatibû pê. Hîs û bihîstiyariya însanî, eve bû; bayekî sivik ko di

nav wext û heyaman, war û welatan, dar û pelan de digeriya.

Guhdarên ezîz, dema dil neşewite, çav jî hêstiran narijîne. Dema mirin  
bi yekî eyan nebe, ew bi vî şêweyî, nayê xewnan jî. Xewna min,  
mirina ko  
li rê ye, nîşanî min da. Bi min eyan e, min zêde wext nemaye. De  
bilezînin, qendîlê bînin, li koşa hanê ya li ber serê min, li ser refê  
deynin,  
tasa min a avê tijî av bikin, çend cixaran bipêçin, tevî heste û  
xwelîdankê  
deynin ber min, hûn jî xwe ji heyata derve ko hûn jê tên, xelas bikin  
û  
guhê xwe bidin ser dangan, dengên wext, heyat û hîsan...  
Dengê dara tûyê, heke meriv bixwaze ferqekê têxe navbera dengên  
daran,  
ji dengê dara çinarê yan ji dengê dara henarê cuda ye. Dengê dara  
çinarê  
ya sedsalan mîna dengê çiyayê Cûdî ye, ko jê dengê kûr û dûr  
bilind  
dibe. Dengê dara henarê ya jar mîna dengê aveke biharê ye, ko  
hûrik û  
tenik diherike. Herçî dengê dara tûyê ya xemilî ye, mîna dengê axa  
avis e,  
ko jê dengê heyatê tê. Welatê Cizîra Botanê tijî dar û ber e, her  
celeb dar,  
her texlîd şinahî tê de heye. Tu bi kêfa xwe yî, çi darê bixwazî, tu  
dikaî li  
binî paldî, çi darê bixwazî, tu dikarî hilkişiyê.  
Di salên min ên xortaniyê de, bi meraqeke xortekî nûgihîştî, mîna  
gelek tiştên din, ez ketibûm pey daran jî, hem darên bêber hem yên  
biber.  
Darên li qiraxên çemê Dîcleyê, yên li ber ling û li ser sînga çiyayê  
Cûdî,

yên bajarê Finikê ko bi keleh û avahiyên xwe yên tarîxî ko bi kevirên  
spî  
lêbûne, meşhûr e, yên der û dorên Gurgil, Kiver û Birkê ko şinahî hîç  
çu  
carê jê ne kêr e, yên welatê Torê ko darên erdê beyar in û ji darên  
hemû  
navçê cihê ne, yên welatê Hekaran ko darên çiyayên bilind û  
newalên kûr  
in, min ev hemû, hema çi bigire, yek bi yek dinasîn.  
Umrê min hingê gihîştibû hevdeh, hejdehan, simbêlên min êdî mîna  
qeytanê, rîha min ko min jêdikir, mîna erdê cotkirî bû. Bejn û bala  
min  
ko jixwe girs bû, her diguherî û sal bi sal girstir dibû. Cil û berg  
biçûktir,  
sol û pêlav tengtir, derpî û kiras qirêjtir dibûn. Pêşiya derpiyên min  
ên  
delingdirêj bi çilkên mîz û avikê, hertim, zer bûn. »Bilo,« belê Biloyê  
bêbav ko êdî bîr bi hal û hewalê çerxa felekê dibir, mîna darên  
çiyayê  
Cûdî, hema çi bigire hertim, serbilind bû. Ne bi tenê di xew û  
xewnan  
de, herweha di dawet û dîlan, tahziye û şînan de jî. Bilo ko diviya  
hevalê  
herî baş ê min û bedena min bûya, qulipîbû ser cinawirekî bêbext û  
fet-  
baz û hertim, li her derî, nefes li min diçikand û dixwest min, ji bo  
102  
daxwazên xwe, bifetisanda. Wî ne li min, ne li dil û mêjiyê min û ne  
jî li  
tiştêkî din difikirî. Wî her mîna xwe dikir, li pey xewn û xeyalan,  
strana  
xwe ya bêdeng a daxwaz û mirazan digot;  
Hûr û kûr

Nerm û germ

Tenik û nermik...

Lê belê herçend bejn û bala min mîna dareke biharê şax dida, dengê min

mîna dengê şêrekî doriya û min êdî xwe peyayekî tirtire ko dikarîbû bi

her şixulî rabûya, dihesiband, ewçend jî min xwe mîna şêrekî ko di qefesê

de ye û di qefesê de diore, hîs dikir. Cizîr êdi ji min re biçûk dihat. Cizîra

Botan bi carekê bûbû teng û hew kel û besta min tê de radibû. Tevî ko

Armê û Gulîzerê hê jî li wir bûn û wan jî mîna min bejn davetin û memikên wan bûbûn mîna sêvên Hewrexê. Dil û ruh, mêjî û heş êdî bi

firê ketibûn, min dil hebû dinya bidîta, dewr û dewranên din, welat û ba-

jarên din jî nas bikira. Cizîr, çemê qedîm ê Dîcleyê ko di Cizîrê re bi fit-

loke çiv dida û diherikî, keleha qedîm ko ji pênc hezar salan û vir ve her

li kêleka çem şahidiya herikîna wext û çemê Dîcleyê dikir, qesra Mîr ko

avahiya herî bedew a keleh û bajêr bû, xaniyên din ên spehî yên kelehê,

çiyayê Cûdî û çiyayên din ên doralîyên bajêr ko bergeheke bêpayan di-

anîn pê, qiraxên çem û darên qehîm ko li qiraxên çem bilind dibûn, riyên

fireh ko li kêlekên çem, mîna şîrîkên qedera çem bûn, taxên kevn ên ba-

jêr ko ji hezaran salan û vir ve şahidiya tarîxeke kevnare dikirin, taxên file,

cihû û êzidiyan ko rengêkî taybetî direşandin ser bajêr, kuçe û kolanên teng ên bajêr ko hertim tijî şênî bûn, bazarên bajêr ko meydana civîn û civatên hemû welatê Cizîra Botanê bûn û ehlê gundan hebûn û malên xwe dianîn û lê difirotin, mazatên pez û dewaran ko tê de ji hemû welatê Kurdistanê her celeb pez û dewar hebûn, dûkanên etar, necar, koşkar, terzî ko piraniya wan di destê file û cihuyan de bûn, qahwexane û aşxane ko piraniya wan di destê ehlê misilmanan de bûn, xan û hemamên bajêr ko hema çi bigire hemû di destê ermen û keldanan de bûn, mizgeft û medrese, dêr û hevra, ezan û zingil ko her yek bi ahenga xwe ya taybetî dengê xwe bilind dikir, evane hemû êdî perçeyên heyata min bûn û êdî çu kel û bestê nedigîhandin ruhê min. Min ew dinasîn, gav bi gav, li wan deran geriyabûm, qult bi qult jiyabûm. Li her koşeyî, li her derî tecrubeyeke min a xas, serpêhatiyeyeke min a nemir hebû.

103

Min bajarên nû, war û welatên nû, însan û zimanên nû, tecrube û ser-pêhatiyên nû diviyan. Yên nû diviyan li yê kevn zêde bûna. Mîna daran, şax û pelên nû diviya li şax û pelên kevn zêde bûna. Herçî Medresa Sor bû, êdî ez jê têr bûbûm. Min xwendina xwe biribû

serî, bi zimanê erebî hedîs xetim kiribûn, rêzên Fîrdewsî, Şîraz, Sadî  
û  
Xeyam bi farisî dixwendin, bi îlmê Îbnî Xaldûnê mexrîbî û hin alîmên  
din ên welatê Rojhilatê dizanîbû, rêzên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran  
û  
Ehmedê Xanî hemû, bi kurdî, jiber kiribûn, di hicreyan de keser û  
eziyeta paqijî û manewiyeta ruh kêşandibû, bi salan di nav nivînê  
gemarî  
û odayên teng ên Medresê de, bi ronahiyeke gelekî qels a  
qendîlekê, destê  
min ê çepê di nav şeqê min de, min piraniya kitab û kaxizên ko di  
Medresê de bûn, xwendibûn û êvareke şilî ya biharê, di hizûra Mîr  
de, ko  
Mam Sefo jî li wir bû, li meclîsa kêleka Birca Belek, li der dengê  
baran û  
çêm, li hundir pisepisa mele, seyda û şêxan, min beytên alîmên  
îslamiyetê  
û rêzên Melayê Cizîrî xwendibûn û Mîr jî tevî kêsekî tijî dirav ez perû  
û  
pîroz kiribûm û bi rûyekî geş ez ji hizûra xwe bi dûr xistibûm. Ez hê  
jî di  
navbera Medresê, mala Apê Xelef û Mam Sefo de, mîna miyeke gêj  
an jî  
mîna tiralekî kuçeyên peregende, bêkeys, bêkar, diçûm û dihatim,  
lê min  
her ji xwe dipirsî; min ê êdî li Medresê çi bikira?  
Wexta min bi kitab, rêz, şîir, stran, çîrok, serpêhatî û şevbuhêrkan  
der-  
bas dibû. Ne mal û milkên min ne jî pere û dewlemendiyên min  
hebûn,  
hê jî min bi xêra alîkariya Mîr û Mam Sefo fort davêtin. Min hem  
stran

digotin hem jî li hev dianîn. Hingê min xistibû serê xwe, ez ê bibûma  
ke-  
sekî xwedî şan û şoret, bibûma dengbêjekî xwedî rêz û rêzdarî, lê  
herçî  
stranên ko min çêdikirin, ne bi dilê min bûn. Ne zimanê wan çu  
ziman  
bû, ne jî ûslub, lihevanîn û mijarên wan. Hema çî bigire her êvar û  
her  
şev, piştî ko şevbuhêrk xelas dibûn û şênî diçûn, min dest bi stranan  
dikir.  
Ji stranan re bêdengî diviya, bêdengiyêke taybetî ko tê de tovên  
afirînê  
hene. Tevî ko ez ji stranan razî nebûm, wextên min ên herî xweş,  
ew wex-  
tên bêdeng bûn ko hingê dilê min, mîna lehikeye ko xwe digihîne  
deryayan, haş dibû, ruhê min dikete nav bêdengiyek ko bi dengên  
stranan xemilî bû. Di nav nivînên qirêj ên Medresê an jî yên paqij  
ên  
mala Apê Xelef ko bi destên nermik ên Gulîzerê hatibûn şuştin de,  
lehîf  
heta ber qirika min kêşandî, carina, mehên germ, pencere vekirî,  
carina,  
wextên sar û seqemê, di oda genî de bîhnçikiyayî, min her digot,  
rêzên  
kevn û nû, yên do û îro li hev siwar dikirin û stran li pey stran li hev  
di-  
anîn. Lê tiştêkî stranan kêmbû. Çi? Di wan kitab, şîr û rêzên ko min  
104  
wan salên xortiyê, dixwendin an jî lê dinihêrîn de, tiştê herî bala min  
dikêşand û coş û heyecaneke taybetî dida min, salixdana şeweyên  
heyatê  
bûn. Şeweyên heyatê, deng û pejnên wê ko ji heyata ko ez heta  
hingê

jiyabûm, xurtir, dewlemendtir û balkêştir bûn. Di dawiya dawîn de,  
piştî  
bi sedan stranên tewş û pûç ên şevên min ên tenê ko min ji hîç  
kesekî re  
nexwendin û zûtirîn wext ew ji bîr kirin, ez têgihîştim ko kêmaniya  
stranên min ev yeka hanê bû; şeweyên heyatê, deng û pejnên  
jiyînê,  
dewlemendî, balkêşî, ders û tecrubeyên heyat û jiyînê. Belê, ez  
têgihîştim  
ko straneke hêja û kemilî, bi tenê, dikare li ser avahiya ders û  
tecrubeyên  
têkel ên însanî were pê.  
Min û stranên min ev diviyan...  
Şevêk ji wan şevên min ên wekhev ên guman û ponijandinê, ko ez  
li  
mala Apê Xelef bûm, piştî şevbuhêrkeke xweş bi çend rîspiyên  
êzidiyan  
re, li ber destê sibê, ez ji nişka ve ji xew hişyar bûm. Bîhna min  
çikiyayî,  
nefesa min teng bû. Bi zehmetî min nefes digirt, xwîdan ji min diçû  
û  
tiştêkî mîna gurmistekê qefesa sînga min diguvişand. Bi lez, bi tirs û  
xo-  
fa ko ez tê de bûm, min rahişt tasa avê ko hertim, ez li kû bûma, li  
ber serê  
min bû û min ava tasê hemû vexwar. Piştî ko hinekî bîhna min  
derket,  
min xwe da hev û avêt derve, nik çêm. Dinya çikî sayî bû, tevî ko  
baran  
nîn bû, şilî ketibû erdê.  
Şeva wan rojan jî mîna şeva xewna min bû ko berî niha bi bîskeke  
min



ji we re qal kir. Hawîrdor bêdeng, her der di nav aramiyeke boş de bû.

Li milê min ê rastê girseyeke tarî ji daran hebû û ez ber bi wan çûm. Zaroktiya min li wan deran derbas bûbû; min dar yek bi yek dinasîn, heta bi guherînên wan ên salewextê, mêş û moz, teyr û tilûrên ko dihatin

û vediniştin jî dizanîbûn. Di her destpêka biharê de ez heftê du, sê caran

diçûm nik daran û bi wan re dipeyivîm; darê, min digot, betirpêrar gewdê te jar bû, niha firehtir e. Dara biyê, xanima daran, betirpêrar ev şax

û guliyên te nîn bûn, niha bi wan şax û guliyên tu bêtir xama yî. Dara be-

hîvê, bûka cilspî, pêrar kulîlkên te yên spî derengtir bişkovîn, lê par û îsal

zûtir...

Dar têkel bûn; darên sedsalan ên çinaran ko her yek ji wan bi qasî xaniyê Apê Xelef stûr bûn, darên nazenîn ên serwî û bî ko bi bedewî xwe

dirêjî çêdikirin, darên gumreh ên berû ko tevî şax, gulî û çiqilên xwe

mîna heyateke şên dixuyan û darên biber ên tû, behîv, biyok û sêvan ko

malê herkesî bûn.

Mîna xewna min, hingê jî ez çûm bin dareke şên û kulavê germ ê şî-  
105

vanan ê Apê Xelef li min, li ser totikan rûniştim. Min ji mêj ve dest bi

cixarê kiribû, titûna ko min dikêşand, ne bintaya titûnên tewş bû, titûna

min, titûneke qamaş a zer ji welatê Mûş û Hekaran bû û pelên cixarê jî ji

aliyê Heleb û Bêrûdê dihat. Mam Sefo qutiyeke zîvîn a titûnê ko bi

neqşên xweş dibiriqî û Apê Xelef jî hesteyekî kevirî ya ji aliyên çiyayê  
Şingalê dabûn min. Hingê di bin dara tûyê de, bi hevaltiya dengê  
çemê  
ko li ber min diherikî û ronahiya stêrên ko êdî ji min xatir dixwestin,  
di  
nav wê bîhtengiya min a bêpayan de min çend cixare pêçandin û  
ew li  
pey hev kêşandin. Ji bilî cixarekêşanê min çi dikir, ez li çi difikirîm?  
Hîç  
nayê bîra min, lê ez bawer im, dilê min ê tirsok ê bizdayî, ruhê min  
ê ner-  
mijokî û mêjiyê min ê tevizî hingê li çu tiştî jî nedifikirîn. Welê, di  
nav  
dûmana ko ji cixarê bilind dibû û mija ko di ser ava çem re, bi  
alîkariya  
bayekî sivik xwe dilivand de, ez xilmaşî bûm û bi qasî bîstekê di xew  
re  
çûm.  
Çaxa min çavê xwe vekir, êdî ne mij mabû ne dûman, tîrêjên tavê li  
ser  
çem dilîstin, ronahiyeke tenik di navbera şax, gulî û pelên dara tûyê  
re  
diseridî, taveke tîr û şewqîn di ser gopikên çiyayan re dirêjî  
hawîrdor  
dikir. Beybûnên spî û binevşên mor ko li der û dorên min dixuyan,  
serî  
rakiribûn. Ji axa nerm bîhneke nerm a giya û hêşinahiyê difûrî. Canê  
min, hemû bedena min tevizîbu, min nikarîbû lingên xwe bilivanda.  
Welê, li ser giyayên ko bi qasî bihustekê bilind bûn, min xwe dirêjî  
erdê  
kir û ji jêr ve li jor, li dara tûyê, gewdê, şax, gulî, çiqil, pel û tûyên  
wê yên

zer û kemilî nihêrî. Pel hêdîka diliviyan, bayekî sivik di navbera pelan  
re  
diliviya.

Dara tûyê, ez fikirîm, umrê wê ko kesî pê nizanîbû, gewdê wê yê  
girs ko

bi dirêjahiya deh salan hatibû pê, hêz û quweta wê ko bi şev û bi  
roj, her-

tim li ber berf û bahozê, baran û pûkê, tav û tîrê li ber xwe dida, reh  
û

rêçên wê ko di kûrahiyên axa reş de mîna gurmistên şêrekî bi axê  
re bûbû

yek û çu quwetê nikarîbû ew jê bi dûr xista, heyata wê ko ji reh û  
rêçan

heta pel û libên tûyan di hemû aliyên wê de, bi dûzan, mîna xwîna  
în-

sanekî hertim diherikî û xwe diguherand, rawest, aramî û  
gumrehiya wê

ko bêyî ko ew xwe bilivîne û bi derekî din de here, hertim di nav  
tevgereke xurt de bû, bi van hemû milên xwe, dara tûyê emsaleke  
baş bû

hem ji bo min hem ji bo însanan.

Ez hê welê difikirîm, tûyeke bi qasî pêçiyekê ji darê ber bi jêr bû û  
hate

kete ser çavê min ê kor. Siûda min a qebrax! Min bideng got, tû dê  
were

û xwe li aliyê min ê reş biqelibîne!

106

Min ceza tûyê dayê, ew avêt devê xwe, şîrê tûyê devê min bi şêrî-  
nahiyeke ecêb xweş tijî kir. Min ji dora xwe çend libên din jî hildan  
û

avêtin devê xwe. Her danê sibê, berî ko min dest bi cixarê bikira,  
min

pariyekî nan dixwar da ko tahma devê xwe biguheranda. Wê sibê jî

xurîniya min, tûyên lezîz û mezin ên çemê Dîcleyê bûn.  
Dara tûyê, dîsan ez fikirîm, berî niha bi pênc salan jî dar weha mezin  
bû, berî niha bi deh salan jî, roja yekemîn ko min xwe li binê veziland  
jî.  
Kê ev li vir çandiye? Umrê wê çi ye? Bîst sal, pêncî sal, sed, du sed,  
sê sed  
sal? Kê ev dara yekta mîna şitil dîtiye, av daye şitilê, pelên wê yên  
yekemîn  
ko bişkovîne, hijmartine, ahengek dane şax û guliyên wê, tûyen wê  
yên  
yekemîn xwarine? Kê mîna min di bin de pal daye, di xew re çûye?  
Kê  
xwe spartiye siya wê, di bin de sifre danîne û xwarin xwarine? Belê,  
însan  
hatine û çûne, dewr û dewran, wext û mewsim hatine û çûne, lê  
dara tûyê  
her di cîhe xwe de maye û şahidî li her celeb hatin û çûyinê, li her  
celeb  
guherînê kiriye. Xwezî niha zimanê vê darê hebûya, min got, wê ser-  
pêhatiyên xwe, tişt û bûyerên ko wê dîtine, gotin, sohbet û stranên  
ko wê  
bihîstine, bigota û ji min re behsa tecrubeyên xwe bikira...  
Li ser serê min dara tûyê, li ber min jî çemê Dîcleyê û ji min hinekî  
bi  
dûr, li qiraxên çem, çend teyrên mezin ko bi qulingan dişibyan,  
dixuyan.  
Çemê Dîcleyê bi serpêhatî û tecrubeyên xwe yên bi hezaran salan,  
bi  
aramî, li ber min diherikî. Çem ji kû dihat û ber bi kû diherikî, li kû  
diza,  
li kû winda dibû? Wî li war û welatên din çi didîtin, bi kîjan av, avzê,  
gol,  
co, çem û deryayan re dibû yek, ji kîjanê vediqetî?

Dara tûyê, çemê Dîcleyê, ez qîriyam, deng derxin, dengê xwe bilind bikin, çêla însanan, wext û heyamên wan, serpêhatî û tecrubeyên wan

bikin. Lê ne dar ne jî Dîcle dipeyvî, bi tenê dengê sivik ê bayê ko di navbera şax, gulî û pelên darê re û di ser pêlên avê de xwe dilivand, dihat.

Dara tûyê, çemê Dîcleyê... tevî bedewî û gumrehiyê, sukûneta wan; tevî xemil, bedewî û aramiya wan; tevî umrekî kevn, dewlemendî, ber,

hêşînahî û rengên wan; tevî bêdengiyê, serpêhatî û tecrubeyên wan; tevî

bêzar û bêzimanî, comerdiya wan...

Însan jî diviya weha bûya, ez fikirîm; însanekî gumreh, lê sakîn; bi xemil, şox û şeng, lê aram; umrekî xas, lê dewlemend, biber, hertim bi kar

û şixul; bêdeng, lê xwedî tecrube û serpêhatî; ne devsist û çengebaz, lê

comerdê gotina ders û tecrubeyan...

Zanîn û tecrube, li wir, li ber devê çem, bêyî ko kesekî wan bibîne, dest

li min dikirin.

107

Hingê, di bin dara tûyê de, piştî ko min têt tû xwarin, lê berî ko min dest bi cixarê kir, çavê min li ser tîrêjên şewqîn ên li ser ava Dîcleyê, min

biryareke nû ya heyata xwe da û biryara xwe, ji xwe, ji dara tûyê û çemê

Dîcleyê re, çend caran, bi deng, dubare kir; Biro, te gaveke nû ya heyatê

divê. Biroyê tiredîn, te ders û tecrubeyên nû yên heyatê divên.

Biroyê kor

ko dixwaze ji korahiya xwe stranan derxe, çavê xwe yê sax veke û li min û

li darê binihêre (heke tu dikarî), te mîna vê dara tûyê kemilandin, xemi-landin, şax û gulî, ber û dewlemendî divê. Biro, Biroyê nîvçe, nîvçav, nîvêzidî, nîvmisilman, nîvfile, nîvcihû, nîv ji vir, nîv ji wir, de rabe pê, bide rê û here, heta ko ev çemê hanê ko tu pê mezin bûyî, ko tu strana wê dihûnî, diherike, heta ko çem xwe digihîne çemên din an jî deryayên din, tu jî pê re be û pê re here. Biro, sêwiyo, tu bî, tu ji bîr nekî; bipirse, me-tirse. Biro, tiralo, de rabe ser piya û here nik hevalên xwe, wan yek bi yek, Migo, Heme, Têlî, Yezdînşêr û yên din bibîne û ji wan re bi dengê nerm mîna dengê vê dara tûyê bibêje; tecrube bi ceribandîna tîpê û ceribandîna neceribandîna hertim çêtir e... Dengê nexşeyên bêzar û bêziman, mîna dengê zelzêlê, dengê tîkel e ko ji dûr û kûr tê. Piştî ko min biryara xwe da, dengê war, welat, bajar û de-verên nû û kevn, şên û kavil di bîr û heşê min de, gav bi gav, bi cîh bû. Min êdî dizanîbû ka daxwaza dilê min çî bû; min dengê wan cîhên ko kahniya ders û tecrubeyên însanî bûn, diviya. Çaxa ez ji dara tûyê veqetîm, min xwe da kuçeyên teng ko di taxên kevnare yên bajêr re digihîştin mala Mam Sefo. Danê sibeyeke ronî û ze-lal bû, lê bajêr, ji mêj ve, dest bi heyata rojane kiribû. Bazar, mazat, dûkan, qahwexane, kolan tijî bûn. Pez, dewar, ker, hêstir, hesp, hiştir li bin guhê hev diketin, dengên tîkel li hev diqelibîn û gumegumeke welê

bi ser bajêr de ketibû ko we dê bigota roja mahşerê ye.  
Li mala Mam Sefo ko bi qasî demeke dirêj bû, min serî nedabûyê,  
tavilê, ez çûm mitbaxê, warê ko hertim tê de şênî hebûn. Çend  
qewraş bi  
tiştine mitbaxê daketibûn. Min ji qewraşeke jar û zirav ko berî yên  
din  
pêrgî min hat, Migo pirsî.  
Migo ne li malê ye, ewê, rûtirş, gote min, lê Armê û dayika wê li jor  
in.  
Ji demeke û vir ve min Armê jî nedîtibû û heke ez rastiyê bibêjim  
min  
bêrî jî li wê, li lîstikên wê ko hê berdewam bûn, li endama wê ya  
dirêj, jar  
û lawaz, li memikên wê ko li gora bedena wê gelekî kiçik bûn, kiribû,  
lê  
min hingê wext nebû ko ez biçûma jor, nik wê û diya wê.

108

Migo li kû ye? Min ji qewraş, rûbiken, pirsî, tu pê dizanî?  
Wê nizanîbû, lê qewraşa ko li ber tifikê bû û agir vedida, li min  
vegerand.  
Eger ez ne şaş bim, Migo divê li dêrê be.  
De bi xatirê we, min got û ji wir lezand. Lê berî ko ez ji derî derkevîm,  
li wan vegeriyam û min domand,  
Heyra, ji Armê û diya wê re mebejin ko ez hatime. Ew ê li ber bikevin  
ko min ew nedîtine. Ez ê piştî şixulên xwe werim.  
Bi lez ez çûm dêrê ko ji qesra Mîr bi qasî sê taxan û ji camiya Nebî  
Nûh  
bi qasî çend sed gavan bi dûr bû. Bexçeyekî fireh û dirêj ê dêrê hebû  
ko  
hertim bi hêşînahiyê bedew reng dida û tê de her celeb dar û  
çiçek  
hebûn. Dêr, bi her awahî, hostahiya avahiyên ermenan nîşan dida.  
Hosteyên ermenan ew, kevir bi kevir, xemilandibûn, kevirên reş ên

çiyayê Cûdî û kevirên spî yên mermer ko ji aliyên Mûsilê hatibûn  
anîn,  
mîna bergehê, li hev anîbûn û jê avahiyeke yekta anîbûn pê.  
Deriyên  
mezin ên dêrê yên bi rengê tarî ko ji darê gwîzan hatibûn çêkirin,  
hemû  
bineqş û bixemil bûn. Pencereyên dêrê fireh, banê wê bilind bû.  
Berê jî,  
ez çend caran, bi Mam Sefo, Migo an jî bi Armê û diya wê re çûbûm  
wir,  
lê di wî danê sibê de, dêra ko di nav tîrêjên tavê de leylan dida, mîna  
avahiyeke efsanewî dixuya.  
Di wî danê sibê de Migo li wir çi dikir? Bi meraq, min hêdîka deriyê  
mezin vekir û ez ketim hundirê dêrê. Belê, Migo li wir, li milê din ê  
dêrê,  
li ber xaça stûr a Nebî Îsa ko stûxwar, li serî taca tijî stirî, xwîn li enî,  
dest  
û piyên wî bizmarkirî, melûl, li jêr dinihêrî, tevî bi qasî panzdeh xort  
û  
keçên din, li piya rawestabû û distra. Cîhê ko Migo û hevalên wî lê  
bûn,  
loş bû, lê tiştê ecêb, ew di nav ronahiyeke zahf geş de bûn. Tîrêjên  
tavê di  
pencera jorîn re xwe dirêjî wan kiribû û ew hemû, tevî Nebî Îsa,  
xistibûn  
nav xelekeke zêrîn a ronahiyê. Hingê li hemû welatê Cizîra Botanê  
bi  
tenê çend avahî hebûn ko pencereyên wan bi cam bûn. Dêr, yek ji  
wan  
avahiyên bû. Camên taybetî, ez nizamim ka kîjan, lê ji welatekî  
Ewrûpayê  
anîbûn û pencereyên dêrê xemilandibûn. Camê pencereyan tîrêj  
dibirîn



û şewqa wan, hîn xurtir, vediguhezandin hundir. Migo û hevalên wî  
ni-  
ha di nav wê topa nûrê de distran. Wan, bi hev re, îlahî ko ermenan  
jê re  
digotin şaragan, dixwendin. Lê ev îlahiyên ko niha dihate xwendin,  
ne  
mîna îlahiyên gaxantan bûn, ew bêtir bi hedîseke Încîlê dişibiya.  
Migo ez nedîtibûm, bi qasî çendekê ez welê li kêleka derî, li ser  
textekî  
dêrê rûniştim û min guhê xwe da şaraganê. Dêr, stran, şaragan,  
koma  
109  
musîkê, dengê hedîsan ko çêla însanan dikir... tiştên ko min hertim,  
li  
her derî jê hez dikir; gotinên ko hal û hewalên însanan digotin, çêla  
ser-  
pêhatiyên însanî dikirin. Ma li Medresê jî ne welê bû? Li wir jî min ji  
hen-  
dese, ebced û hesaban bêtir ji gotin, rêz û hedîsên ko qala bûyer û  
serpe-  
hatiyên însanî dikirin, hez nedikir? Ma gotinên ko dibûn dengên  
însanî  
bêtir bala min nedikêşandin? Musîk, deng û gotinên ko çêla keser û  
janê,  
veqetîn û hesretê dikirin, hêvî û baweriyê, ked û xwîdanê salix  
didan, geh  
li dêrê, geh li mizgeftê, geh li vir, geh li wir, coşeke ruhanî dida min,  
wan  
dengine nû di ruhê min de dianîn pê. Li dêrê, li wî cîhê nîvtarî, be-  
dewiyeke ruhanî bilind dibû. Lê ne zêde bi aheng.  
Min dest li Migo kir û çaxa Migo ez dîtîm û ji komê veqetiya, bêyî  
ko  
ez li hêviya wî bisekinim, ez ji dêrê derketim.

Te xêr e? Tu weha danê sibê hatiyê dêrê? Migo gote min, berî ko ew de-  
riyê dêrê di pişt xwe re bigire.  
Strana we baş bû, min bi dengekî gelekî nerm lê vêgerand, dengê we li  
hev dihat û hemû bi hev re awayekî paqij ê ruhanî dianî pê.  
Çawan? Wî, hinekî ecêbmayî û bîhnçikyayî, pirsî û ber bi min hat.  
Bejna min jê dirêjtir bû, lê herçî gewde bû, gewdê wî heke bi qasî  
gewdê  
çinarekê nebûya jî, bi qasî gewdê dareke kal a spîndarên girs ên der  
û  
dorên çeme Zapê bû. Wî jî simbêl û rîh berdabû, lê ne mîna bavê  
xwe,  
mîna keşeyekî dêrê, ko rîh li ser cênik û gumikan jêdikirin, simbêl û  
rîh  
bi hev re li ser çengê dikirin yek û şeklekî mîna çerxekê didanê.  
Bêguman yekîtiya dengê tîz û dengê qalind girîng e, min destê xwe  
bir  
ser simbêlên xwe û gotê. Ahengeke pêwîst divê di navbera dengê  
keçan û  
kuran de hebe. Bi qasî ko min dît we hîn bêtir xîret divê da ko  
ahenga  
dengan were pê; dengên bilind û nizm, dengê keç û kuran, dengê  
haletên  
musîkê û însanan.  
Biro, wî dîsan gote min, tu van tiştan ji kû hîn dibî? Kî hînî te dike?  
Tu  
mîna keşeyê me yê koma dêrê dipeyivî!  
Çu kes... min gotê û ez bêdeng rawestiyam.  
Çima tu hatî? Wî, piştî bêdengiyêke bi qasî kêliyêkê, ji min pirsî. Tu  
hatî ko van tiştan bibêjî?  
Na, min gotê. Na. Ma em dikarin bi hev re herin mala we,  
kitabxanê?

Niha?

Belê, niha...

Wî dengê xwe nekir. Em ketin rê û bi hev re çûn malê, bêyî ko em li rê

ji hev re tiştêkî bibêjin, ew bi meraq, ez jî bi sedan pirs û fikiran. Li malê

110

tavilê me xwe gîhand qata jor, kitabxanê. Min hilma giran a kitabxanê ko

min bêrî lê kiribû, bi nefeseke kûr kêşand hundirê xwe.

Kuro ev bîhn, ya toz û gemarê ye, toza kitaban, Migo got, mîna ko bîhna misk û emberê be, tu mîna reqekî avî serê xwe dirêj dikî, difnên

xwe vedikî û nefes digirî.

Ne xem bû, bila ew bipeyiviya. Ronahiyê li kitabxanê jî leylan dida, tîrêjê tavê li hundir diçirûsîn. Her tişt li kitabxanê mîna xwe bû. Lê îcar

li ser masê kitab zahf zêde bûn. Piştî ko min awirek avêt teyrê tawis ko li

dîwêr bû, min lezand deriyê şaneşîna kitabxanê, ew heta dawî vekir, ji wir

jî çûm ber masê, bêyî ko ez li wan binihêrim, min hemû kitab dan hev û

ew danîn kuncikekî, ber lingê refeke bilind. Migo bêdeng li min dinihêrî,

tevî ko hê wext nehatibû ko min merama xwe jê re bigota, ji bo ko ez

tiştêkî bibêjim, min di ber re avêt.

Di vê roja xweş de xwezî em niha li war û welatekî din bûna...

Wî awirek ji min veda, lê dengê xwe nekir, bisebir li min, li tevgera min

a bilez û bez nihêrî. Ez çûm milê derî û ji çaviyeke mezin a refekê min

çend nexşe derxistin û anîn, danîn ser masê. Bi dû re jî ez vegeriyam  
ser  
refê ko ez hertim li berê bûm, refê kitabên Keso, Naso, Maro û yên  
din  
ko dengê dewr û dewranên kevn digîhandin min. Ji wir jî min bi tenê  
kitaba Keso ya rêwîtiyê wergirt û ez vegeriyam ber masê.  
Migo, ji kerema xwe were, min got û li ser masa dirêj nexşeyên  
çermîn  
ko bi penûsên rengîn hatibûn nexşandin, vekirin. Sê nexşe li ber me  
ve-  
bûn. Nexşeyek der heqê welatên ko di Tewratê de behs dibûn, bû.  
Yeka  
din, hukimdariya mezin û fireh ko Îskenderê Mezin bi ger, tevger,  
rêwîti  
û vegirtinên xwe ava kiribû, nîşan dida. Ya sisiyan jî li ser rêwîtiya  
Keso û  
deh hezar leşkerên yewnanî ko pê re bûn, bû.  
Li van binihêre, min gote Migo, çavê min li ser nexşeyan, bêyî ko ez  
lê  
binihêrim, li van war û welatan, bajar û mekanan binihêre.  
Berê jî min ew dîtine, li wan nihêrtiye, ewî, kurt û kin, got.  
Di hersê nexşeyan de jî çemê Dicle û Firatê, mîna du xêzên esasî yên  
nexşeyan, herweha wan war û welatan, ji welatên bakûr ber bi  
welatên  
başûr, bi fitloke, bi çiv, geh li kêleka hev, geh ji hev dûr, ber bi jêr  
dibûn  
û li jêr, berî ko ew bi deryayê re bibin yek, xwe digîhandin hevûdu.  
Migo, min bi dengekî zahf nizm got, birayê min ê ezîz, ma em ne  
kurên  
çemê Dicleyê ne?  
Herê, wî got.  
Ma ev hersê nexşe jî çêla me, tarîx, serpêhatî û qedera me nakin?

Heye ko ew dikin...

Na, ne ko heye ko ew dikin, ez ji te re bi misogerî bibêjim, ew çêla me dikin.

Biro, dev ji dînîtiye berde, Migo, biacizî, li rûyê min nihêrî û gote min,

tu çî dixwazî bibêjî? Daxwaza dilê te çî ye? Ez divê vegerim dêrê.

Daxwaza dilê min eve ye, min got û rawestam da ko bala wî, bi tamamî,

bikêşînim ser dengê xwe yê nermik. Daxwaza dilê min birayê min ê de-

lal, ez, tu, Heme, Yezdînşêr û hevalên din, em hemû bi hev re bikevin rê

û bidin pey Dîcleyê û pê re herin, heta war û welatê ko ew tê de xwe digi-

hîne deryayê. Em wan war û welatan bibînin, însan, heywan ax û çiyayên

wan binasin, li dengên wan ên xerîb guhdarî bikin, ji avên wan vexwin,

nan û xwarinên wan ên ko em nas nakin, bixwin.

Biro, hinekî bizdidayî, mîna ko ew vecinîqe, got, min dizanîbû ko tu dîn î, lê ne evçend! Te mêjiyê keran xwariye? An te mêjiyê xwe bi kayê re

xwariye? Bibêje, çî bi te hatiye?

Na, birayê min, min sakîn jê re got, êdî wext hatiye ko em bi firê kevin,

ders û tecrubeyên nû ko ji tarîxeke kevnare tîn, li heyata xwe ya xeşîm

zêde bikin...

Tiredîno, tu bawer î ko Bavo dê rê bide? Eger ew rê bide jî ka pere, ka

îmkan, em ê çawan herin, kî dê me bibe, bi kû de?

Tu van tiştan hemûyan li hêviya min bihêle, birayê xwe yê man û  
ne-  
manê, min destê xwe yê çepê avêt ser milê wî û gotê, xwediyê  
sebrê,  
melîkê Misrê ye. Hîç xem mexwe, kesê ko bikeve dîlanê, divê xwe  
bihe-  
jîne jî.  
Baş e, eger em li wan welatên xerîb riya xwe şaş bikin, winda bin?  
Şaşî hertim para me însanan e. Ma em li vir jî riya xwe şaş nakin?  
Ferz  
bike ko me li wan deran riya xwe şaş kir, lê ma ne îhtimal e ko em  
bikarib-  
in ji riyên şaş riyeke nû derxin, ne welê?  
Tu mîna însanên baqil napeyivî, dev ji van sewdayan berde, here  
ser kar  
û şuxilê ko tu pê dizanî, ez divê herim, ewî got û bêyî ko li min  
vegere an  
jî guhdarî bike, bi bazdan, da rê û çû...  
Ez, kenek li ser rûyê min, di destên min de nexşe û kitêb, derketim  
şaneşînê û çûm li ser dîwana ko li milê çepê bû, rûniştim. Min nexşe,  
yek  
bi yek, dîsan vekirin. Dido ji wan bi latînî, yek jî bi erebî bû. War,  
welat,  
çiya, deşt, av, çem, bajar, gund hemû erdên Mezopotamyayê di  
nexşeyan  
de, kite bi kite, dixuyan. Dicle, Firat, Zap, Xabûr, Diyarbekir, Mêrdîn,  
Cizîrê, Berwar, Mûsil, Bexda, Bedrî, Lalêş, Nînove, Babîl, Êr, Sûsa,  
Şet-  
112  
ul Ereb hemû li ber min bûn. Mîna ko dengên têkel ên wan war,  
welat û  
bajaran ji nexşeyan bilind bin û li ber guhê min kevin, bi qasî bîskeke  
min

çavê xwe girt û guhê xwe bel kir. Ez kî bûm, ji kû bûm, aîdê çi û kê bûm?

Heye ko çu kes û çu kesî, çu war û çu welatî. Lê belê heye ko herkes û

herkesî, her war û her welatî.

Di nav wan fikir û gumanan de, min bi tenê, bi tişteki dizanîbû; ez kî bûma, aîdê kê bûma jî, kes û nas, war û welatê min di nav wan nexşeyan

de bû.

Piştî ko min çend cixare kêşandin, li nexşeyan nihêrîn, li dengên ko ji

nexşeyan bilind dibû, guhdarî kirin, min nexşe danîn aliyekî, li çemê Dîcleyê nihêrî û kitaba stur a Keso vekir. Min dizanîbû ka rûpel û berge-

ha ko ez lê digeriyam, li kû bû. Min wê rûpelê heye ko berê jî bi sedan

caran vekiribû, vekir. Sûretekî ko seranserê rûpel vegirtibû, dixuya; bi

qasî deh leşkerên Keso ko hemû çekdar bûn, bi feryad û fîgan, li ser kelekekê, ji qiraxekî asê yê çemekî har ko pêl dida, ber bi qiraxê din ê çem

diçûn. Bi çi zimanî diqîriyan? Qîreqîra wan çawan bû û ya herî girîng, wan ê bikaribûya xwe bi milê din ê çem bigîhanda? Ew ê bikaribûna ji

pêlên har xelas bûna? Li ber min çemê Dîcleyê, bi qasî kêliyekê dirêj, serê

min bi pirsên min ên hertimî yên weha tijî, min li sûret, çem, kelek, û î-

sanên li serê nihêrî.

Dengê kelekên çemê Dîcleyê, mîna dengê defê ye, – ko ji dûr ve xweş

tê. Gava însan dengê defê dibihîse, welê bawer dike ko dîlan e, her tişt

xweş û rind e. Lê rewş pirî caran ne mîna dengê dûr e. Herçî kelek  
e, ga-  
va meriv lê siwar dibe û wê berdide nav çêm, hingê tavi lê her tişt  
diguhere. Mîna her tiştî, kelek jî qayideyên xwe yên xas hene. Bi  
serê me  
de jî welê hat, rêwîtiya me ya çêm û serpêhatiya me û kelekê, ne li  
gora  
daxwaza me, lê li gora qayideyên kelekê hate pê.  
Piştî ko min daxwaza dilê xwe ji Migo re got, bi qasî çend mehan,  
heye  
ko bi qasî salekê, ez her li xewna çûyinê fikirîm û min miraza xwe ji  
gelek  
kesên din re jî got. Herwekî Migo, di destpêkê de herkesî henekên  
xwe bi  
min kirin an jî gunehê xwe bi min, bi xortê sêwî ko heş ne li sêrî bû,  
anîn.  
Tevî ko ew war û welatên nexşeyan gelekî nêzîkî me bûn, însanan  
ew  
gelekî dûrî xwe didîtin, mîna ko ew heft qat di binê erdê de bin, an  
jî heft  
qat li ser asimanan. Ew war û welat, ji bo însanên ko gundekî nêzîkê  
Cizîrê jî mîna welatekî dûr dihesibandin, mîna war û welatên xewn,  
ef-  
sane û çîrokan bûn.

113

Bi dû Migo re, ez bi Hemeyê malwêran re, geh li malê, geh li  
Medresê,  
peyvîm. Heme ko jar, zirav û bejndirêj bû, xwe dabû îlmê îslamiyetê  
û  
wî dil hebû ko bibûya alimekî jîr. Heşê wî ko hertim bi mesele û  
dozên  
gelekî manewî û bilind tijî bû, tiştêk ji hal û hewalê min, ji bîr û  
dîtinên



min nedibirî. Heme ko hevalên wî, hema çî bigire, hemû mele û feqeyên  
rîspi û navsale bûn, hê hingê bi cidîyet û rûtirşiya xwe hatibû nasîn,  
lê ga-  
va wî ez didîtim û hinekî li min guhdarî dikir, kenekî şermoke dihat  
û li  
ser wechê wî yê esebî vedinişt. Gotina wi ya yekemîn, hertim eynî  
bû:  
Kuro, dev ji dînitîyê berde, hinekî cidî be, ewî digot û mîna  
mamosteyên me yên Medresê, gotinên xwe yên esasî, mîna libên  
tizbiyê,  
di nav pêla gotinan de, li pey hev, yek bi yek, giran bi giran, rêz  
dikirin;  
cidiyet esas e, îlahiyet li ser her tiştî ye, manewiyat girîng e,  
serfiraziya dînî  
hedef e...  
Heme ko simbêlên zirav li lêva xwe ya zirav a jorê zêde kiribû,  
tesbiyên  
not û neh libî di destan de, hertim libasên paqij ên nûşuştî li xwe  
dikirin  
û herçiqasî bi qasî hedîsên pêxemberan nebûya jî, hê di wî umrî de,  
hewl  
dida ko mîna hedîsan ko tijî ders û şîret bûn, bipeyiviya. Lê dawiya  
dawîn, piştî xîret û rikeke bêpayan, min Heme ko êdî pê re li ser tir  
û fisên  
wî henekî nedibû, îkna kir. Rojekê, li Medresê ko êdî bi tamamî war  
û  
welatê Heme bû, li malikeke teng ko gava Heme bi îlmên bilind  
radibû,  
xwe dispartê, min Heme xewle kir û careke din gotin anî ser  
rêwîtiyê.  
Kitabên Îbnî Erebî û Ehmedê Xezalî li ber wî, ruh û heşê wî bi nûra  
îlahî

jixweveçûyî, piştî gotinên wî yên herdayim, wî, bi dengê nerm ko  
tê de

êdî çilkên hevî û nermahiyê hebûn, ji min pirsî,  
Ez dizanim şixulê te, ne şixulê aqilan e, lê tu bibêje min, eger tu dest  
bi

rêwingiyê bikî, te dil heye ko tu herî Bexdayê jî?

Min pirsî wî bêguman fahm kiribû. Pêşî ez li ser Îbnî Erebbî û Xezalî  
û

li ser mezinahiya wan, paşê jî, bi qasî kêliyê dirêj li ser Bexdayê,  
Harûn

Reşîd, padîşahê ko dînê îslamîyê derxistibû qata heftan a  
asimanan,

medeniyeta îslamî û Bexda, pêwendiya çîrokên Hezar û Şevê û  
Bexdayê, Şehrezada ko hemû çîrokên welatên Mezopotamyayê her  
şev, li

pey hev, bêwest û bêrawest digotin, peyivîm.

Hemeyê bira, min gotê, bifikire ko ev çemê Dîcleyê ko tu niha jî  
dikarî

li dengê wî guhdarî bikî, eynî mîna Cizîrê, di Bexdayê re jî derbas  
dibe.

Bifikire birako, ew şevên Şehrezad û şevên ko Şehrezad qalê dike,  
şevên

Bexdayê ne, şevên ko bi stêrên helesor alem û asimanan  
dineqîşînin; ev

kitabên ko niha li ber te ne, ew kitabên ko em dixwînin, hemû bi  
awayekî

114

xwe digihînin Bexdayê. Herçend hemû riyên Ewrûpayê xwe  
digihînin

Romayê, ewçend hemû riyên Rojhilatê jî xwe digihînin Bexdayê.

Bifikire, ez, tu, hevalên din, em hemû bi hev re li Bexdayê...

Piştî xeberdana min a dirêj ko ne kêmî gotareke manzûm a  
neqîşandî

ya edebiyata erebî bû, ewî dengê xwe nekir, bi bêdengiyê re ez jî  
hew  
peyvîm û min hêdîka Heme, tevî kitabên wî, li hicra ko bi hilmeke  
giran  
bîhn li merivan diçikand û bi qendîlekê ronî dibû, terk kir û ez  
derketim.  
Lê tiştê ecêb ev yeka hanê bû; însanê ko herî zêde ez jê ditirsiyam  
ko  
bibêje na û rê li ber me bigire, ji bervajiyê, însanê herî maqûl derket.  
Belê,  
ez qala Mam Sefo dikim. Migo ez tirsandibûm û min welê bawer  
dikir  
ko dema min meselê jê re vekira, ew dê bi misogerî bigota no. Lê  
welê  
nebû. Û berî ko ez meselê jê re vekim, ewî gotin anî ser mesela  
rêwîtiyê.  
Em bibêjin bi qasî şeş, heft mehan bi dû axaftina min a yekemîn a  
bi  
Migo re, rojekê, danê êvarê, li mala Apê Xelef, ez û Apê Xelef ko êdî  
gelekî kal bûbû, li ber derî, bala me li ser tîrêjên tavê ko li ser ava  
Dîcleyê  
rengê sor û mor dianî pê, li ser kursiyên nizm rûniştibûn û qala  
serhişkî  
û guherînên Heme dikir. Keyayekî Mam Sefo hat û bangî min kir ko  
ez  
biçûma malê, nik Mam Sefo. Min Apê Xelef ko êdî ne dikarîbû li  
bilûrê  
xista, ne behsa berîvanên guhantijî bikira û ne jî gunik bifirkanda, di  
cîh  
de hişt û bi bazdan ez çûm mala Mam. Mîna gelek caran, Mam,  
qelûn di  
dev de, simbêlbadayî, cil û bergên botî yên rengîn lê, li kitabxanê  
bû. Lê

îcar ew ne bi tenê bû, li nik wî pisporekî din ê Mîr, Apê Oxir ko navê wî

yê esasî Oganês Çalktiyan bû û mîna Mam Sefo bi eslê xwe ermen, lê î-  
n-

sanekî kal ê rîspî û kinik bû, li piyan, li ber masê rawestabû.

Were, Biro were, Mam gote min.

Min deriyê kitabxanê hêdîka girt û ez gav bi gav çûm nik wan, kêleka masê. Li ser masê kitabine nû yên bi çermê reş û sor cîldkirî ko min hîç

nedîtibûn, hebûn.

Tu birakê min Oxir dinasî, ne welê? Mam ko êdî kalîtiyê şopên xwe li

ser rû û eniya wî bi cîh dikirin, biken, ji min pirsî.

Herê, min, çavê min li kitaban, gotê.

Kitab... van kitaban mamê te Oxir ji Kostantînopolê anine. Ew nû ji wir tê. Piştî vê gotinê, Mam ko hinekî din qelewtir bûbû û hema çi bigire

stûyê wî bi mil re bûbu yek, vegeriya ser Apê Oxir û jê re qala min, jîriya

min, hewesa min a kitaban, daxwaza min a dengbêjiyê kir. Lê ji nişka ve,

ew dîsan vegeriya ser min û bilez pirsî,

Biro, ka tu nabêjî min, mesela te û çûyinê çi bû?

115

Ewî ji kû bihîstibû? Min dizanîbû ko Migo, ji ber tirsê xwe, pê re nepeyivîbû. Çu pêwendiya Mam û Heme jî nîn bû. Min hê ji Armê re jî,

da ko ew pê neêşe, behsa çûyinê nekiribû.

Gava meriv kar û şixulê mîrekiyekê digêrîne, bivê nevê, haya merivan

ji gelek tiştan dibe, Biro. Min bihîst ko te dil bi rêwîtiyekê heye, ne welê?

Dengê wî nerm mîna qedîfe bû. Min ji deng derxist ko min dikarîbû

her tiştî, tevî ko Apê Oxir li nik me bû, jê re bigota. Dîsan bîlez û bez  
min  
xwe spart nexşeyan, ew derxistin û anîn li ber wan raxistin û mîna  
berikên  
tivingeke şexşane ya helqedar, min gotin li pey hev, bêyî ko ez  
nefeseke bi-  
girim, reşandin. Geh bi dest û pî, geh bi tevger û nîşan, geh bi nexşe  
û ki-  
tap, geh bi rêz û gotinên kitabên ko ez hîn bûbûm, ez bêrawest her  
peyivîm, – heta ko Mam bi milê min girt û ez dam sekinandin.  
Biro, ewî bi hêdîka got û hinekî rawesta da ko ez li xwe warqilim,  
niha  
guhê xwe bide min, Biro tu baş dikî, baş difikirî. Here. Migo jî bi xwe  
re  
bibe û here... gotineke me heye, dibêjin, bi xweziya kes ranahêjê  
baqê  
keziya. Tevger divê. Herin, reh û rêçên me hemûyan, yên te, yên  
min,  
yên Migo, yên ehlê file, yên misilmanan, yên cihuyan hemû li wir in,  
herin wan war û welatan bibînin, hê ko dereng nebûye... Apê te  
Oxir ko  
ji Stenbolê tê, xeberên kirêt ên şer anîne. Dûman dîsan ji beroşa Âlî  
Osmanê bilind dibe, saraya Siltanê Osmanî dîsan dikele. Welê  
dixuye ko  
bayê xerbî yê şer ber bi me tê. Berî ko ba xwe bigihîne me, hûn  
herin, ez  
ê aliyê we bikim, herin...  
Çend hêstir li ser bîbikên çavê min, mîna wê roja yekemîn ko ez li  
kitabxanê bûm, dîsan min xwe avêt destên wî.  
Texmîna wî rast derket, çend sal bi dû wan gotinan re, bayê xerbî  
yê şer  
xwe gîhand deverên me jî... bayên xerbî yên şer... gotineke çiqas di  
cîh

de... çêla me jixwe li ser vê gotinê ye, ez ê werim ser bayên xerbî û şer jî,

lê niha gotina min li ser çûyinê, çûyina ber bi bayên şerqî yên tarîxê ye.

Piştî ko Mam Sefo vekirî piştgirî li min kir, şixulê min jî gelekî hêsan bû û fikra çûyinê li bajêr deng da. Herwekî ko seriyên simbil ên genim ko

gava dikemilin, li pey hev, yek bi yek dibişkivin, piştî gotinên Mam, hevalên min jî yek bi yek hatin ser daxwaza min. Migo gote erê, Heme

ko çu carê, ji bo çu tiştî razîbûna xwe diyar nedikir, gote »hele em bini-

hêrin«, lê gotina wî jî herê bû. Min dil hebû ko Yezdînşêr jî bi me re bi-

hata, lê di wan wextan de, ji bo ders û perwerdeyiya eskerî, tevî çend

kurên din ên beg û serekeşîran, ew çûbû mektebeke navdar a osmaniyan.

Herçî Têlî, kurê Mîr bû, ewî dixwest bi me re bihata, û ne bi tenê ew,

116

Necîb û Elî Şamil ko birayên wî bûn û êdî bejn avêtibûn, bi xwe re bianiya. Lê Têlî kurê Mîr bû ji herdu çavan kor bû. Ez kor, ew kor, Heme

jixwe korê alemê, Migo korê nefis û bedena xwe... Halê me dê çi bûya?

Herwekî ko hatiye gotin, heke kor bide pey kor, ew ê di koncalê de werbe. Tirsî min jî eve bû, ko em hemû di nav pêlên Dîcleyê de werbû-

1. Li milê din, heke tişteki bi serê wî û birayên wî ko hê jî zarok bûn, bi-

hata, diviya heta mirinê êdî min pê li axa Cizîra Botanê nekira, da ko min

bikaribûya xwe ji hêrs û xezeba Mîr ko gelekî nas bû, rizgar bikira. Ji ber  
vê yekê min cesaret nekir ko ez kel û coşa Têlî rakim û min jê bi tenê  
xwest ko ew ji bo me û rêwîtiya me dua bike û ji Yezdanê dilovan  
niyaz  
bike ko em bi ser kevin.  
Ji bilî wan jî zahf kesên din dixwestin bi me re werin, lê me koma  
xwe  
fireh nekir û dawiyê biryar da ko Migo, Xerapêt ko bi eslê xwe  
ermen û  
hevalekî min û Migo bû, Heme, Kemaledîn, hevalekî Heme yê esebî  
û  
jixwerazî ko kurê şêxulîslamê Mîr Mele Evdilqudis bû û ez, bi hev re  
biçûna. Pênc kes ko umrê wan di navbera hejdeh û bîst û pêncan  
de bû.  
Lê koma me ne bi tenê hewqas bû, sê kesên din jî lê zêde bûn; Apê  
Yaqûb,  
kurê wî Bedros û segê wan Gurzo. Herê, hûn dikenin, lê segê wan jî  
bi  
qasî insanekî, bi qasî min û hevalên min jîr, bîrbir û baqil bû. Heke  
Gurzo ko segekî gurix ê yeman ê çiyayên Hekarê, deverên Tiyarî bû,  
bi  
me re nebûya, heye ko em bimiriyana. Apê Yaqûb ko keldan bû û  
dostekî  
baş ê Mam Sefo bû, kelekvanê herî hoste yê hemû navçê bû. Mam  
Sefo  
pê re peyivîbû ko ew rêberiya me bike û em rêwîtiya xwe pê re li  
dar xin.  
Kurê wî Bedros ko di umrê me de û li dêreke çiyayê Aşîta û  
Tixûmayê, li  
ber destê keşeyên nastûrî şagirtî fikir, xwestibû tevî me were.  
Ez dirêj nekim, di keleberbangeke sibeyeke destpêka payizê, di  
wextekî

ko stêr edî diheliyan, gupikên çiyân êdî hişyar dibûn, kerwan  
haziriyên

xwe yên rêwîtiyê dikirin, diz ji keleporên xwe vedigeriyan, keleş û  
mêrkuj

tivingên xwe tijî barût û gule dikirin, mele û keşeyan ji bo nimêj û  
niyazên sipêdê dest û rûyê xwe dişuştin, lê însanên ko her rojeke  
nû li

umrê xwe zêde dikirin, hê jî di nav xew û xewnan de bûn, yanî di  
wextekî

bêdeng de ko ji bilî dengên tebiyetê çu deng hê nîn bû û bi her  
awayî li

çîrok û serpêhatiyan dihat, li milê jor ê çêm, li ber pozê qiraxên  
Dîcleyê

yên Birca Belek a qesra Mîr, Migo, Heme, Xerabêt, Kemaledîn û ez  
ko

her yek ji me xwedî xewneke xas û li pey hedefeke taybetî bû, tevî  
sindoq,

zexîre û barên xwe, em li keleka Apê Yaqûbê simbêlboq, ko kurê wî  
Bedros û segê wî Gurzo yê çikî spî û bi qasî însanekî girs jî tê de bûn,  
si-

117

war bûn, me ji Mam Sefo, Armê, Apê Xelef, Gulîzerê, Têlî û çend  
heval,

dost, xisim û nasên din ko ji bo birêkirinê hatibûn, xatir xwest, berê  
xwe

da welatên jêr û dest bi rêwîtiya xwe kir.

Dengê Lalişê ko ez li pey bûm, bi hêsanî negihîşte min. Lê berî ko ez  
gotinê bînim ser Lalişê, ez ê kite bi kite, ji destpêkê, ji we re çêla  
rêwîtiya

me bikim. Me di destpêkê de şaşiyeke mezin kiribû, em, rêwiyên  
kelekê,

mîna erd û asiman, roj û şevê, ji hevûdu cihê bûn. Kel û heyecana  
min



çavê min ê sax jî kor kiribû da ko min tiştê nebûyinê, yanî tiştê ko herî berbiçav bû, nedîta. Zaroktiya min, Migo û Heme bi hev re derbas bûbû,  
lê em êdî mezin bûn û herçiqas derew bûya jî me xwe zilamên xwedî nav,  
cîh û rûmet dihesiband. Em her yek bi awayekî perwerde bûbûn û her yekî ji me riyek û armanceke xas dabû ber xwe. Migo û Heme, tevî ko ew li hev hatibûn û bi hev re dipeyvîn, jixwe, piştî pevçûna wan, ji hev ne xweş bûn. Xerapêt hevalê Migo bû. Min ew dinasî, lê Heme û hevalê Heme wî nedinasîn. Herçî Kemaledîn bû, hûn bibêjin, xezebê Xwedê bû; esebî, cira wî nexweş, ji ken û henekê bi dûr, pozbilind. Kemaledîn ko di ser pozê xwe re bi çu kesî qayil nedibû, bi bejna xwe ya dirêj û jar, rûyê xwe yê zirav, mezinê me hemûyan bû û mîna bavê xwe ewî jî dabû ser riya îlim û medresê û dîsan mîna bavê xwe, dixwest li herkesî, li her cîhî, her wext, hukim bike. Ne bi tenê xûy û cira me ji hevudu cihê bû, herweha xewn û hedefên me jî gelekî cihê bûn. Ji lewre herkesî dil dikir ko rêwîtiya me li gora daxwaz û hedefên wî bihata pê. Hê di roja yekemîn de, piştî ko em ji bajarê Cizîrê veqetiyên û ketin ber pêlên Dîcleyê, danê êvarê ko em, ji bilî Apê Yaqûb û Bedros, hemû bêx-ew, westiyayî û bi heyecana rêwîtiyê sersem, peregende, li vir û li wir, li

ser kelekê dirêj bûbûn, bi qîrîna Kemaledîn, li rastiya xwe ya kirêt  
veg-  
erîn. Kemaledîn bi dengê xwe yê circirok ko bi dengê qijikekî  
dişibiya,  
dikir qîjeqîj;  
De rabe here ji nik min, neynok file, zû ke, here. Gemariyê pîs î her-  
am...  
Kemaledîn ko ji wê qîjeqîjê û pê de min navê wî qulipand ser  
Kamoyê  
circirok, diqîriya ser Migo ko hinekî ji Kamo bi dûr vezilîbû. Migoyê  
ziko ko girs û qelew bû û hertim, sal dozdeh meh, hem di berfê hem  
di  
tavê de jê bîhna xwîdanê dihat, welê dixuya, cîh li Kamo teng kiribû.  
Heke me rê lê negirta, Migo ko di xew de bû û bi qîjeqîja Kamo  
veciniqîbû, ê Kamo bi şelpeyekê gêrî avê bikira.

118

Çi ewteewtê dikî, segê har! Migo gote Kamo û xwe da hev da ko  
êrîşekî  
mîna êrîşên pilingên Ermenistanê ko hîç kesekî nedîtibûn, lê herkesî  
qal  
dikir, bibe ser Kamo.  
Herçiqas bal û endama Migo mîna pilingan nebûya jî, dengê wî bi  
dengê pilingan dişibiya, nemaze çaxa çavê wî bi perda hêrsê mîna  
gula  
bilûrê diçirûsî, orînê pê diket. Lê Apê Yaqûb ko li milê wan, li kuncê  
kelekê, bi bêrikeke dirêj rê li ber kelekê rast dikir, tavilê xwe gîhand  
wan  
û nehîşt ko Migo şelpeya pilingan di rûyê Kamo de biteqîne. Di  
esasê  
xwe de, li wir, li ser ava Dîcleyê dengê piling û dengê qijikan rabûna  
hev  
û di ser de Kamoyê jixwerazî noqî ave bûya, hîç xirab nedibû, lê me  
hê nû

dest bi rêwîtiya xwe ya xewnan kiribû. Gava em jî gihîştine nik wan,  
me  
ew ji hevûdu, heye ko heta dawiya heyata wan, veqetand û Migo  
hate nik  
min, milê dawîn ê kelekê û Heme ko herçiqas mîna berê bi ecêbeke  
giran  
nebûya jî, hê jê tir û fis diçûn, lezand milê pêşîn ê kelekê û çû nik  
Kamo,  
hevriyê xwe yê manewî.  
Piştî vê xirecirê ko mîna barana nîsanê ji nişka ve hatibû û bêyî ko  
dinya  
bide ber xwe, dîsan ji nişka ve, winda bûbû, dinya me ya biçûk a  
keleka  
li ser çemê Dîcleyê hinekî haş bû. Jixwe roja me ya yekemîn jî rojê  
germ û zelal a dawiya nîsanê bû. Kesên ko bi hal û hewalê çemê  
Dîcle û  
Firatê û rêwîtiya kelekan dizanîbûn, şîret li me kiribûn û gotibûn ko  
me  
diviya berî dawiya meha adarê çu rêwîti nekira. Heyama çile û  
zivistanê,  
heyama herî dijwar a Dîcleyê ye, berf, baran, zîpik û bahoz ava çem  
diqulipîne ser ava Derya Reş ko hertim bi xezeb diçelqe. Hingê av  
welê  
bilind dibe ko pêlên Dîcleyê xwe digihînin sînga gir û zinarên qiraxên  
çem. Li gora şîretên Apê Yaqûb, me ne bi tenê meha adarê, lê hema  
çi bi-  
gire hemû meha nîsanê jî li pey xwe hîşt da ko me bikaribûya di  
heyameke aram û zelal de, bêyî îhtimalên nexweş û endîşeyên  
xeteran, bi  
selametî rêwîtiya xwe li dar bixista.  
Gerçî min dizanîbû ko li ser ava Dîcle û Firatê, ji hezaran salan û vir  
ve,

hertim, bi kelekan çûyin û hatineke boş hebû û însan, heywan, mal  
û  
zexîre hem ji jorî Mezopotamyayê ber bi jêrî Mezopotamyayê hem  
jî  
bervajiyê wê, cîh û war guhestin, lê tevî vê yekê, heta ko ez bi  
kelekê, li ser  
ava çêm, ber bi jêrî Dîcleyê nebûm, min nizanîbû ko Dîcle û ava  
Dîcleyê  
xwediyê heyateke xas e û rêwîtiya kelekan li ser Dîcleyê, dinyayeke  
xas e.  
Hê di roja me ya yekemîn de em pêrgî bi dehan kelekên tijî însan,  
hey-  
wan, telîs û sindoq hatin ku, bi tevgereke geş lê aloz geh ber bi jor  
geh ber  
bi jêr diçûn. Heyata li ser ava Dîcleyê şên bû, kelekvanan hevûdu  
dinasîn,  
119  
gava ew pêrgî hevûdu dihatin, hal û xatirên hevûdu dipirsîn, ehlê li  
ser  
kelekan silav didan hevûdu, kelekan mal û tişt mîna titûn, berikên  
tiv-  
ingê, goştê qelî, sebze, hêjîr û tûyê hişk, gwîz û behîv, savar, penêr,  
çortan  
didan hevûdu an jî bi hev re diguherandin.  
Apê Yaqûb ko hemû umrê xwe li ser avê bihurandibû, gotibû me ko  
li  
milê rojavayê Mezopotamyayê, piştî welatê Torê, Mêrdîn, Nisêbîn  
û  
Ras-ul Eynê, eynî mîna Dîcleyê û ehlê li ser çemê Dîcleyê, rêwîtiyeke  
boş  
li ser çemê Firatê jî hebû. Ne bi tenê ehlê der û deverên çem diçûn  
û di-  
hatin, herweha esker û zabîtên ordiya Osmanî, paşa û miteserifên

dewletê, karmend û karbidestên welatên Ewrûpayê, şêx û begên ereban,  
keşe û serekên ruhanî yên ermen, keldan û nasturiyan, mîr û begên kur-  
dan, hemû li ser kelekan, bi kêfxweşî, li ser ava çîk î şîn, rêwîti dikirin.  
Dicle û Firat... di nexşeyên Mam Sefo de ko dudo ji wan li nik me bû,  
ev herdu çemên muqedes hertim bi xetên kûr û neqîşandî dixuyan.  
Herdu çeman jî li jor, li welatê Serhedan dest bi heyata xwe dikirin û ji  
wir, Dicle li ser xeta Diyarbekir, Cizîr, Nînova û Mûsil, Nemrûd, Aşûr, Tekrîd, Samara, Bexda û Kut-el Amara, herçî Firat bû, ew jî li ser xeta Gerger, Bîrecûk, El Hama, Raka, Dêrezor, Mecadîn, Ana, Hit, Babîl, Ur  
û Basrayê ber bi jêr dibûn û herdu çem li Şat-ul Erebe digihîştine hev û  
bi hev re xwe digîhandin deryayên boş ên bêdawîn. Dicle û Firatê her  
celeb welat, her texlîd ax, her şêwe xelk didîtin, di erdên wan re dibihurîn  
û dawîya dawîn di derya boş de winda dibûn. Çiya û zinarên sar ko her-  
tim gopikên wan bi berf û qeşayê spî dikirin, dar û daristanên şox ko î-  
san nikarîbû tê re derbas bûya, newal û geliyên kûr ko ji bilî heywanên  
dirende çu kesî nedîtibûn, deşt û beriyên zer ko bi erdên xwe yên biber  
hertim kahniya heyata însanên Mezopotamyayê bûn, çol û qûmên germ  
ko ji dinya çiya û zinaran gelekî cihê bûn, hemû bi hev re, perçeyekî hey-

ata çeman danîne pê. Bi dehan, heye ko bi sedan ziman, zarave, gel, ehil,

eşîr, civak û mîrekiyên ko qedera çeman danîne pê; ziman û kilamên kevnare yên însaniyetê, dîn û olên herî kevn ên hemû cîhanê, şer û pevçûnên xedar ên tarîxê, ev hemû aîdê tarîxa çeman bûn. Welatê Tewratê, serpehatiyên Nînova û Babîlê, ger an jî vegera deh hezar es-

kerên Keso, meşa eskerî ya Skenderê Makedonî û mirina wî, bajarên ko

mîna stêrekê çirûsîbûn û bi dû re hilweşiyabûn, medeniyetên ko dewle-

mendiyeke nû li tarîxa însaniyetê zêde kiribûn û bi dû re winda bûbûn,

ordiyên ko hukim li hemû dinyayê kiribûn û bi dû re têk çûbûn, avahî û

eserên bêpayan ên însaniyetê ko bi regekî hêlesor ronahî reşandibûn ser

120

însaniyetê û bi dû re, bi zelzele û tofanên ko ji Mezopotamyayê hiç kêr

nedibûn, bi erdê ve bûbûn yek... Welatê navbera herdu çeman, axa bilin-

dahî û hilweşîn, serketin û şikestin bû.

Heye ko li cîhanê ji hemû çeman zêdetir, pî û milên Dicle û Firatê hebûn, li cîhine navçê, çeman nêzîkî li hev dikirin, li cîhin jî ji hevûdu bi

dûr diketin, li herêmên çiyayî çemine din mîna Zap û Xabûrê xwe digîhandin çeman û ava wan gurtir, boştir dikirin, li cîhine deştê, çem

mîna deryayekê fireh dibûn, di newal û geliyan de, bi çivên fetloke, diqulipîn ser aveke teng mîna co û kahniyan.

Ma însan û însaniyet jî ne weha bû? Tarîxa însan û însaniyetê jî ne mî-

na çeman û qedera wan bû?  
Li ser kelekê, çavê min li qirax û bergehên doralîyên çêm, hema çi  
bi-  
gire hertim di nav van hîs û fikiran de, geh li pê, li nik Apê Yaqûb,  
geh  
rûniştî, geh nivistî, ez hêdî hêdî ber bi kûrahiyên tarîxa welatê  
navbera  
herdu çeman dadiketim. Keleka Apê Yaqûb, yek ji kelekên herî  
metîn û  
qehîm a hemû Cizîra Botanê û Mûsilê bû; kelek ji darên dirêj û  
qehîm ên  
gwîzan hatibû pê û dar bi werîsên qehîm hatibûn girêdan. Hemû  
do-  
ralîyên kelekê, ji binî ve, bi meşkên bizinên deverên çiyayên Tiyar,  
welatê  
Hekarê ko bi çermê xwe yê qehîm navdar bûn, rapêçayî bû. Helbet  
meşk  
hatibûn werimandin û bi xêra meşkan ko li gora gotina Apê Yaqûb,  
di  
nav sîh salan de bi tenê du caran teqiyabûn, kelek li ser avê bi  
nazenîn di-  
herikî. Lê barê me ko bi dû re bû bela serê me, sivik bû. Gava bar  
giran  
bû, kelek hîn çêtir û qehîmtir li ser ave diherikî, lê gava bar sivik bû  
talûkeyên qulipîn û serûbinbûnê hîn bêtir bûn. Beriya rêwîtiyê, me  
bi vê  
yekê nizanîbû, Apê Yaqûb jî welê bawer bû ko em, garaneke însan,  
ê  
xwedî barekî giran bûna. Lê barê me bi tenê çend telîs zad û zexîre,  
çend  
kîs xwarin û şêrînahî, du sindoqên biçûk ên cil, berg û kitaban bûn.  
Dinya êdî germ bû û me çu tiştên qalind û giran negirtibûn nik xwe.  
Bi

şevê, piştî ko me çend tîke goştê qelî, tevî nan dixwar, me çûl û kulavên

Apê Yaqûb ên kelekê radixistin, cil û kîsên xwe datanîn bin serê xwe, cilekî tenik davête ser xwe û pal dida.

Ji bilî wê qîjeqîja Kemaledînê circirok, sê rojên me yên pêşîn, tevî ko ava me bi cokekê de nedîçû, bi aramî û xweşî bihurîn, heke em mêş û

pêşyan nehesibîn. Bi bilindbûna tavê re, germahiyeke giran hemû

hawîrdor vedigirt û tîrêjan li ser avê, li ser sînga zinarên reş ko lê çu hêşi-

nahî nîn bûn, û zinarên spî ko ji tahtên mermer hatibûn pê û li herdu milên çem dixuyan, leylan didan. Ne bayekî hebû ne jî hûnikahiyekê ko

121

însên dikarîbû xwe bispartayê. Danê êvarê, berî ko ro here ava, dinya

hinekî hûnik dibû, ji bakûr bayekî sivik bi hêdîka radibû û piştî avê mist

didan, lê hingê jî ordiya pêşyan dewsa tirêjên tîn digirt û pêşyên har mî-

na tîrên siwarên moxolan bi însên ve didan. Ji ber tîrsa pêşyan me ne

dikarîbû agir veda ne jî qendîl pêxista. Ne tavê, lê belê pêşyan zora me,

xortên ko av di gunikên wan de werdigeriya, birin û bi êrîş û îlada xwe,

em ji hal xistin. Piştî roja yekemîn, dest, rû û hemû bedena me, bi vedana

pêşyan, bû mîna seradekê ko ji qulên sor hatibû pê. Bi tenê Apê Yaqûb

ko ji mêj ve hînî pêşyan bûbû û Gurzo ko ji nişka ve xwe noqî avê dikir



û piştî kêliyêkê dîsan bi hêsanî hildikişiya ser kelekê, teslîmî pêşyan nebûn.

Piştî sê rojên aram her tişt ji nişka ve guherî, roja sisiyan ko me êdî Cûdî, çiya, dar û tixûbên Cizîra Botanê li pey xwe hîştibû, danê êvarê,

ewrên reş asiman vegirtin, bayekî gur derket û êvarê jî tevî birûskên ko

dikirin çîrçînî, baraneke boş barî. Apê Yaqûb ko rojên weha zahf dîtibû,

bi keft û left, lê bi sikûnet heta hinekî jî kêfxweş, dilopên baran û xwîdanê

li ser eniya wî ya fireh û simbêlên wî yên palik, stranek jî li ser lêvên wî,

kelek kêşand qiraxê çêm, cîhekî dahlde. Barana boş, mîna hatina xwe,

welê jî piştî demekê, ji nişka ve çû. Tevî ko dinya girtîbû û ba hebû, baran

sekinîbû. Apê Yaqûb kelek dîsan berda çêm da ko berî berbangê me xwe

bigîhanda gundekî ko xismên Apê Yaqûb tê de dijiyan. Tariyeke bêpayan dinya vegirtibû, ne stêr û heyv hebûn ne jî bi qasî misqalekê ron-

ahiyek. Me, nemaze min û Bedros aliyê Apê Yaqûb dikir, li ber destê wî,

li gora gotina wî, diçûn û dihatin, tişt didan hev, bi bêrikê geh kelek ji qi-

raxên çêm bi dûr dixist geh rê li berê rast dikir. Ava çêm gelekî bilind bûbû, ava baranê, ava berf û qeşayên çiyayê ko diheliyan, ava kahnî û

coyên biharê ko xwe bi çêm digîhandin, hemû bi hev re, rehên çêm leqandibûn û av bilind kiribûn. Herikîna avê, heke ne mîna lehiyekê be

jî, xurt bû.

Tiştê ko me hîç hêvî nedikir û çu carê nehesibandibû, ber bi destê sibê qewimî. Derengê şevê, piştî ko Apê Yaqûb ji xeweke bi qasî kêliyeke hiş- yar bû û hate bêrik wergirt, em hemû, li pey rojeke giran westiyayî, pere- gende, li ser keleka şil, bi cil û kulavên tenik rapêçayî, ketin xeweke kûr, heta ko em bi dengê Gurzo ji xew hişyar bûn. Çilkên yekemîn ên ron- ahiya sibê, hema çî bigire nû avêtibûn, keleberbangeke nû hê bi tamamî serî ranekiribû, lê tariya şevê qelişibû. Bi hişyarbûna me ve, em hemû veciniqîn; Dîcle har bûbû, pêlên çêm xwe digîhandin sînga zinarên qi- 122 raxê milê rastê yê çêm ko gelekî bilind bûn, kelek bûbû mîna hêlekanekê û li ser avê dizivirî. Tiştê herî xirab, Apê Yaqûb bêrik xistibû û êdî çu bêrik, ço, şiv nîn bûn ko ewî bikaribûya pê kelek ji keviran bi dûr xista. Hingê min hêrs û xezeba Dîcleyê jî dît; Dîcle bûbû cinawirekî ko jê agir diçû, ne gotin, ne xîret, ne hewldan, ne lava, ne jî şer lê tesîr dikir. Xuşexuşa avê û xumexuma pêlan tirs û xofeke nedîtî dianîn pê. Di rabûn û ketina kelekê de, pêşî Migo û Heme ko hê jî xew li ser çavê wan bû, gêrî avê bûn. Bi dû wan re jî, jixwe em hemû; pêleke ecêb xurt kelek mîna mûyekî hilda û paşê li ava çêm xist; ji avê pê ve êdî ne kelek mabû ne jî

tişteki din.

Dengê Nînovayê, dengên ko ji binê axa Nînovayê, bi bayê sivik ê berban-

gan, dinehwirî, li Mûsilê li ber guhê min ket. Lê herwekî we ji çêla kelekê

jî fahm kiriye, min xwe bi hêsanî negîhand Musilê jî. Bi serûbinbûna kelekê re, ew xeyalên min ko me dê bêyî çu qeza û belayê bikaribûya

rêwîtiya xwe bidomanda, bêguman, têk çûn. Hingê ez têgihîştim ko hedefên ko însan didin ber xwe, ger yê şexsî, ger yê fikrî, hertim ji

xewn û xeyalên însên dûrtir û diwartir in û riya wan ne rasterast, lê xwar

û tijî fetloke ye. Xeyalên însên mîna stêra Gelawêjê ne, ko ji dûr ve, piştî

nîvê şevan, di tariya şevê de, rê şanî rêwiyan dike. Çu kes nikare xwe bi

Gelawêja ko mîna xeyalan hertim heye, bigihîne, lê ew li wir, ji însên û

dinyayê bi dûr, di asimanan de ronî ye, diçirûse û rê nîşan dide.

Belê, keleka Apê Yaqûb mîna pelekî dara tûyê yê payîzê, pêşî noqî avê

bû, paşê jî li ser pêlên lehiya ko rabûbû, bi qasî wê dema ko me dikarîbû

bidîta, geh li vî milî, geh li wî milî, li kevir û zinarên qiraxên çem ket û bi

dû re ji ber çavan winda bû û çû. Lê ji ber bextê me yê çê, kes ji me ne-

mir; kelek li bihureke teng serûbin bûbû, me hemûyan bi avjêniyê dizanîbû û di ser de kelekvanekî hoste mîna Apê Yaqûb û segê wî yê jîr

Gurzo hebû.

Ez divê ji we re behsa Gurzo ko ji heft bavên însanan jî baqiltir bû,

bikim. Gerçî Apê Yaqûb ko ji çiyayên Hekaran bû, hê di destpêka  
rêwîtiya me de, destê wî yê rastê li ser eniya çîk î spî ya Gurzo, kenek  
li ser  
rûyê wî yê gulover, bi serbilindî, çêla esaleta Gurzo kiribû û gotibû  
ko  
Gurzo ji bavikeke giregir, heta însan dikare bibêje tirtire, ji bavikê  
navdar  
ê kulabî yê şemoyî, dihat, min esaleta Gurzo ko gelekî mezin û bi  
pazû bû  
û hertim boça xwe, mîna aleke vekişandî, ber bi jor rep dikir, di wê  
kele-  
berbanga sibê, di ava har a Dîcleyê de dît. Di destpêkê de heşê min  
tiştêkî  
123  
ji Gurzo nedibirî, ew jî, heke ez rastiyê bibêjim, mîna min hinekî  
tiredîn  
bû, kesî nizanîbû ka wî dê li kû, çi bikira. Çaxa em hildikişyan  
qiraxên  
çêm û me zarûretên xwe bi cîh danîn, ew nedihat, lê gava em dîsan  
siwarî  
kelekê dibûn û bi rê diketin, li ber çavê me, ew diçû û li ser telîsan  
dimîziya; gava em diketin xew, ew dihat û rûyê me, nemaze rûyê  
min û  
Bedros dialast û em ji xew hişyar dikirin. Gava me sifra xwe ya  
seferiyê ko  
ji nan, pîvaz, bacanê sor, îsot, penêr, çortan, qelî dihate pê, li ser  
kelekê  
radixist, ji nişka ve, ewî xwe davêt avê û em û sifre bi çilkên avê şil  
dikir.  
Mîna ko ew bi me re qayişê bikişîne, hertim vajiyê tiştên ko bi dilê  
me bû,  
dikir; mesela gava tav digihîşte esran û germahî û rêwîtiyê em gêj  
dikirin,

ew dihat li hember me radiwesta, herdu lingên xwe yên dawîn datanî  
erdê, şeqên xwe vedikirin û ef bikin, têrmaşê xwe yê sor rep dikir û  
li me  
dinihêrî. Me dê çi bikira? Lê tiştê herî xweş, wî dizanîbû ka wî dê li  
hem-  
ber kê vê yekê bikira; belê, li hember Hemeyê fistûj û Kemaledînê  
cir-  
cirok. Gurzo diçû, li hember wan rûdinişt, şeqên xwe vedikirin,  
têrmaşê  
xwe mîna tîrekî ko ji kevanê li ber pekandinê be, ber bi wan dikir û  
bi  
hizir, li wan dinihêrî.  
Dilê Gurzo ketiye we, min bi ken digote wan û ez ji wan bi dûr dike-  
tim da ko ew êrîş neynin ser min.  
Heye ko ji ber evîna Gurzo ya Heme û Kemaledîn bû, gava em hemû  
noqî avê bûn, beriya me hemûyan, Gurzo xwe gîhande Heme û wî  
kêşand kêleka çêm, paşê jî Kemaledîn. Gava me, ji nişka ve, xwe di  
nav  
ava sar a Dîcleyê de dît, em veciniqîbûn, di destpêkê de kesî  
nikarîbû  
alîkariya kesekî din bikira. Em, her yekê bi xwe ketibûn. Heke kelek  
li ke-  
vir û zinaran biketa, heye ko çend kes ji me bimirana, lê kelek di nav  
avê  
de ser û bin bûbû, em jî noqî avê bûbûn. Tevî vê yekê av gur, pêl bi  
zexm  
û doraliyên bihurê tijî kevir bûn.  
Berî me hemûyan Gurzo bîr bi rewşê bir û kete pey me. Mîna ko  
gelek  
caran diqewimî û gelek kes dimirin, heke em di avê de gêr nebûn û  
ne-

mirin, tê de keda Gurzo gelek e. Serê Heme li kevirê ketibû û  
qelişbû,  
milekî Migo şikestibû, sê pêçiyên destê rastê yên Bedros jêbûbûn û  
destê  
wî qelişbû, hêtê Kamo, mîna ko te bi kêrê jêkiribe, jêbûbû û goştê  
wî yê  
pelizî dixuya. Parsûyên Xerapêtê ko hertim bêdeng bû, şikestibûn.  
Herçî  
ez bûm, ajnûya min a rastê pêrgî kevirê hatibû û ecêb diêşiya. Bi  
tenê  
Apê Yaqûb ko bi hal û hewalê avê dizanîbû bêyî ko tiştêkî pê bibe,  
xelas  
bûbû.  
Lê kelek, telîs, sindoq, cil û berg, kitab û nexşe, xwarin û vexwarinên  
124  
me hemû di ber avê re çûn û rêwîtiya me ya kelekê ko me dil hebû  
heta  
Samarayê bidomanda, li wir, di nav bihurê de, bi dawî hat.  
Di qewimandinên weha neçê de, divê însan ne li neçêyian, lê li  
çêyiyên di nav neçêyiyê de hene, bifikire, herwekî ko alîmekî ko  
navê wî  
niha nayê bîra min gotiye; dewsa ko em li stiryên gulê bifikirin û li  
ber  
kevin, divê em kêfxweş bin ko gul dikare di nav stiryên de  
bibîşkove. Em  
ji mirinê xelas bûbûn, bi alîkariya Apê Yaqûb û Gurzo me hemûyan  
xwe  
bi qiraxên milekî çêm gîhandibû û gundê ko Apê Yaqûb qal kiribû û  
bûbû sebebê lezandina me, nêzîkî me bû. Bi dû çûyina Apê Yaqûb û  
Gurzo ya gund re, em bibêjin bi qasî danê sibehekê, Apê Yaqûb,  
Gurzo  
û gundî, tevî hesp, bergîr, nivîn û darbestan hatin û em hildan birin  
gund.

Bi qasî sê, çar mehan, heta ko havîna kambax a şewitî jî di ser me  
re  
qulipî em li gund man da ko birînên me hinekî bicebirin. Halê Heme  
ko  
eniya wî ji aliyê çepê ve qelişîbû û hemû qoqê wî kupiyayî bû, gelekî  
xirab  
bû. Bi qasî çend heftan, bêyî ko gotinek ji devê wî derkeve,  
jixweveçûyî,  
ew raza, lê paşê ew hêdî hêdî, roj bi roj, bi ser xwe de hat. Rewşa  
milê  
Migo û parsûyên Xerapêt jî xirab bû, lê ew, mîna birînên Kamo,  
dice-  
birîn. Herçî pêçiyên Bedros bûn, tiştêkî ko însên bikira nîn bû, ew jî  
mî-  
na min diviya hînî derbên felaketan ko di bedena însên de şopên  
kûr di-  
hîştin, bibûya.  
Piştî ko me, her yek ji me li malekê, mehên xwe li gundê ko ji keldan  
û  
kurdan hatibû pê, piştî xwe dabû qûntarên çiyê û tê de darên givîj,  
berû  
û tûyê hebûn, tamam kir, em li hev civiyan; me biryareke nû diviya.  
Biryara min diyar bû; min ê rêwîtiya xwe bidomanda. Rast e, hedef  
û  
xeyalên însên hertim dûrî însên in, lê belê însan divê serdestê wan  
be, ne  
ko ew bibin serdest. Heme ko ji min zahf eciz bû û jixwe hê di  
destpêka  
rêwîtiyê de poşmam bûbû, mîna min nedifikirî û bi çêr û nifiran  
dikire  
pitepit: Aqilê sivik, barê giran e, wî digot, em ketin pê vî tiredînê  
pêxwas

û di van deran de derketin! Herê, ev nezanê bêmesûliyet dikare aşê  
xwe  
bê av jî bigerîne, lê ez nizanim ka em bi çi sewdayê ketin pey vî ko  
nikare  
serê xwe û qûna xwe ji hev veqetîne?  
Heme ko ji mirinê xelas bûbû, keysa xwe li min anîbû û di her  
fersendî  
de mîna zîpikê dibarî... Li gund, di destpêka payîzê de ko darên tûyê  
êdî  
pelên xwe diweşandin û gopikên çîyan bi mijêke boş reşahiyekê  
digîhandin asimanan, piştî xirecîreke bi qasî çend rojan, her yekî ji  
me  
biryara xwe da; Heme, Kamo û Xerapêt ê vegeyriyana Cizîrê. Apê  
Yaqûb,  
125  
tevî Gurzo, Bedros, Migo û ez, em ê biçûna Mûsilê. Apê Yaqûb ko  
bêyî  
kelekan nedihewiya, dê li Mûsilê kelekekê çêkira û Bedros teslîmî  
dêra  
keldaniyan ko gelekî bi nav û deng bû bikira û ez û Migo jî, me dê  
bida  
pey hedef û xeyalên xwe yên destpêkê; me xeyal çandibûn û diviya  
me  
berhemên xeyalên xwe hilda. Herçî birînên me, êşa ajnoya min û ya  
milê  
Migo ko ji wê rojê û pê ve hertim dewam kir, ew jî yek ji berhemên  
xeyalan bû.  
Me Heme, Kamo û Xerapêt, tevî çend siwarên kurd û keldan, li ser  
hespan, ber bi milê rojava, yanî ber bi Cizîrê bi rê kir, da ko piştî  
çend  
salan, li Cizîrê, di nav mij û dûmana agirê şer de, ji nû ve hevûdu  
bibînin.



Me jî, tevî kerwanekî dirêj ko ji deverên Wanê dihat û ber bi  
Bexdayê  
diçû, di berbangeke sibeyeke ronî de, berî ko tav û germahî  
hawîrdor ve-  
gire, li ser deveyan, berê xwe da aliyê rojhilatê, Mûsilê. Me îcar riya  
çêm,  
kelek û keştiyên biçûk ên Dîcleyê nediviya. Heke însan gur, rûvî û  
kef-  
tarên ko nîvê şevan ji nişka ve derdiketin û êrîşî heywanan dikirin  
nehe-  
sibîne, riya kerwanê ermen ko em pê re bûn, ji riya çêm ko ji nişka  
ve  
dikaîbû mîna dizekî rûyekî xwe yê din ê tarî nîşanî însên bida û  
biquli-  
biya ser tofanekê, çêtir bû. Di nav rengên payîzê de, dar û ber bi  
rengêkî  
têkel ê belek neqîşandî, ax, erd û rê zuha û giyayên zer bi tîrêjên  
tavê şe-  
witî, asiman bi ewrên gewher xemilandî, tîrêjên tavê bi germahiyê  
hertim  
tijî, co û gol bi aveke zelal biriqî, teyrên koçer ji deverên bakûr û  
rojava,  
ref bi ref li firê, teyrên dirende, êlo, baz, doxan, başoke, li dora  
kerwanê  
dirêj li asimanan, bi baskên xwe yê xurt, geh li jor, geh li jêr, heyv  
û  
stêrên êvar û şevan bi şewqeke bêpayan çirûsî, çemê Dîcleyê bi  
xuşexuşa  
xwe hertim li kêleka me, xan bi xan, qonax bi qonax, em çûn Mûsilê.  
Di bûyera çêm de ko bû derseke nû ya heyata min û min hêrsa çêm  
ji  
nêzîk ve nasî, me her tiştê xwe winda kiribû. Ne kitab û defter ne  
pere û

zêr ne jî zad û zexîre mabûn. Lê tevî vê yekê, heke em serdestên  
hedef û

xeyalên xwe bûn, hingê diviya em di riya xwe de biçûna. Hêlîna  
teyrê kor

Xwedê çêdikir. A me jî bêguman, Xwedê kerîm bû.

Li Mûsilê ko li hemberî Nînovayê, li milê rojhelat ê Dîcleyê mîna  
şûrekî vekîşiyayî, bi keleh, birc, sûr, avahî, xanî, xan, hemam, dêr,  
mizgeft, hewra, kolan, kuçe, hewş û bexçeyên xwe yên zahf kevn,  
hatibû

pê, em li mêvanxana dêra keldanî ko yek ji avahiyên herî bedew ên  
Mûsilê bû, bi cîh bûn. Mêvanê Xwedê, qewl û dînê wî çî bûya jî,  
mêvanê

Xwedê bû û hemû derî jê re vekirîbûn... Hin keşeyên rîspî yên dêrê  
ko

gelekî baş bi kurdî dipeyivîn û bi eslê xwe ji deverên Şingal û  
Hekaran di-

126

hatin, nasên Apê Yaqûb bûn. Wan bi rêz û rêzdarî em li mêvanxanê  
ko

bi hewşa xwe ji kevirên şehkirî yên reş hatibû pê, eywana xwe ya  
bikem-

ber ko hertim hûnik bû û bi jûrên xwe yên bêhejmar bi qesrekê  
dişibîya,

bi cîh kirin. Me li mêvanxanê dixwar û vedixwar, lê Mam Sefo ko  
ser-

pêhatiya me bihîstibû, dîsan, gihîşte hawara me û pereyekî baş, bi  
kelek-

vanekî xort re, gîhande me. Ne hewce bû ko me çu şixul bikira, ez û  
Migo

ko êdî bûbûn sûtaren bajarê Mûsilê, li bazarên tijî şênî, kolanên  
teng û

fetloke, taxa cihûyan ko navenda zîv û zêrkeriya hemû navçê bû,  
taxa se-

faretxaneyên welatên Ewrûpayê ko taxa herî berbiçav a bajêr bû,  
avahî û  
qonaxên paşa û karbidestên dewleta Osmanî ko merkezeke qehîm  
a  
hemû welatê şerqê bû, qahwexaneyên qiraxên çêm ko hertim bi  
dûmana  
nêrgile, qelûn û cixarê mîna dûgehekê bûn, aşxaneyên gemarî yê  
tijî  
moz, mêş û kelmêş, dûkanên bazar û qiraxên çêm ko qonaxa herî  
girîng  
a kerwanan bûn, digeriyan û me lotik dida xwe. Danê sibê, piştî  
xwirîniyê ko pirî caran ji çay, nan, penêr û zeytûnan dihate pê, em  
dadiketî qiraxên çêm, nik necarên ko kelek û qeyîk çêdikirin û êdî  
bûbû  
mekanê Apê Yaqûb û Gurzo. Ji nik necaran Dicle gelek nazenîn  
dixuya,  
pira ko berî me heye bi bîst, sî salan ava bûbû û ji sî û pênc çavên  
ko mî-  
na kevanekî vekîşiyayî hatibû pê, deşta ko li pey pirê û avê, bêyî çu  
dar û  
beran, mîna deryayeke zêrîn dixuya, çiyayên serqot û tazî ko  
meseleyên  
Tewratê dianîn bîra însên, riyên kerwanan ko di deştê de mîna  
marekî reş  
ê çivdayî dixuyan, hemû li wir, bi hev re bergeheke bêpayan dianîn  
pê.  
Piştî wê, di kuçe û kolanên teng, di bin siya xanî û avahiyên re ko bi  
kelpîçên qehîm lêbûbûn, havînan hûnik, zivistanan germ bûn û  
şêweyê  
herî kevn ê avahiyên navçê nîşan didan, em dadiketî bajêr û diçûn  
bazarên ko bi hatina kerwan û gundiyan qulipîbûn ser roja mahşerê.  
Danê êvaran du tişt li ber dilê me şêrîn bûn; em diçûn û li  
qahwexaneyên

ko di qatên duwemîn ên xaniyên qiraxên çêm de, ji sedan salan û  
vir ve  
her hebûn û cîhê tiralên bêkeys û bêkar ên Mûsilê bûn, li ser  
kursiyên  
nizm û biçûk rûdiniştin, me nêrgile dixwest. Çaxa nêrgile dihat, me  
agirê  
nêrgilê gur dikir, simbêlên xwe yê boke badida û rûyê me geh ber  
bi çêm  
ko hema çî bigire hertim bi renekî leylaqî şewq dida, geh li kolanên  
jêrî  
me ko lehiya însanan, hemal, parsek, diz, zabî, esker, beg, şêx,  
mele,  
keşe, heham, gundî, bazirgan, karmend, karbidest, di nav cil û  
bergên  
gelekî ji hevûdu cihê de, diherikî, guhê me li ser dengên têkel ên  
zimanên  
erebî, keldanî, tirkmenî, hebreyî, ermenî, kurdî ko li bin guhê hev  
diketin, gurz bi gurz nêrgile dikêşand. Hingê me kêfa gurê pîr dikir.  
Tiştê

127

din ko me gelekî jê hez dikir, gera beden û bircên keleha Mûsile bû.  
Keleha Mûsilê ko gelekî bi keleha Cizîrê û ya Diyarbekirê dişibiya,  
ne bi  
tenê bi riya çêm, lê herweha bi çend deriyên xwe yê tarîxî mîna  
deriyê  
Sîncarê, yê Cizîrê ko deriyên kerwanan bûn, pêwendiyê xurt bi  
we-  
latên din re dianî pe. Tevî ko keleh gelekî kevn bû, hê tiştêkî muhîm  
pê  
nebûbû û însan bi hêsanî dikarîbû, di nêrdewanan re hilkişiya ser  
beden  
û bircên wê û ji wir li hemû navçê ko ji hêşinahiyê bêpar bû, lê bi  
asimana

boş û axa gewher û belek ko bi tîrêjên tava ko diçû ava, leylan dida  
û mî-  
na bergeheke çîrokên kevn dixuya, binihêrta.  
Herçî êvar bûn, hingê me dîwana xwe ya bi şox û şahî du deveran li  
dar  
dixist; li ser banê mêvanxanê ko mîna şaneşîna qesra Mîr fireh bû û  
li ser  
bircên keleha Selçûqîyan ko li bilindahiya girekî ava bûbû û hingê di  
deste paşayê Osmanî û wîlayeta Mûsilê de, lê milekî wî ji ehlê bajêr  
re  
serbest bû. Li ser banê dêrê, ji şaraba yaqudî ko keldanên Mûsilê ji  
tiriyê  
yekta yê navçê çêdikirin, pê ve çu vexwarinên din nîn bû, lê li ser  
bircên  
keleha Selçûqîyan ko li wî milê serbest bû, her celeb vexwarin hebû.  
Ji ber  
vê yekê bû ko birc bêtir li ber dilê me ezîz bû. Me sifra xwe ya ko tijî  
her  
celeb xwarin û vexwarin bû, li banê bircê ko mîna meydanake biçûk  
bû,  
radixist, di bin kembera ronî ko ji heyv û stêran hatibû pê, carina ez,  
Migo û Bedros, tevî Gurzo, bi tenê, carina jî mêvan û şagirtên dêrê  
jî bi  
me re, em rûdiniştin û heta derengê şevê, carina jî heta ko tîrêjên  
yekemîn ên tavê hildihatîn, ava çem, bi lêdana ronahiyê, mîna  
mehfûreke hevrêşim î diçirûsî û kelekvanan kelekên xwe berdidan  
çêm,  
me dixwar, vedixwar û bi zimanên xwe yên kurdî, ermenî û keldanî  
stran  
digotin.  
Di şeveke ronî û sakîn a wan şevan de, çaxa stêr êdî diheliyan û wext  
gi-

hîştibû huzmeyên pêşîn ên ronahiya sibeheke nû, cara yekemîn min navê

Stêrê ko bi dû re bû evîndara min a heyatê, bihîst. Ez, Migo, Bedros û

Gurzo bi tenê bûn, mêvanên me yê şevê westiyabûn û çûbûn, lê em

mabûn û me bi seriyekî xweş û bi dilekî coş, rûyê me ber bi milê Nînovayê, destanên kevnare ko xewa me direvandin û wextên bihurî, bi

deng û olanên têkel, bi me digîhandin, digotin. Yek ji sebebên ko em her-

tim diçûn bircên kelehê jixwe ev bû; keleh li ser girekî ava bûbû û ji wir

milê din ê çem, yanî axa Nînovayê, eynî mîna asimên, heta û heta dixuya.

Nînova ko hema çî bigire heftê du, sê caran em diçûnê û li gundekî Nînovayê, bi navê Nebî Yûnis ko hê jî şên bû, dew vedixwar, êvaran jî

mîna bergeheke bêdeng li ber me raxistî bû. Bedros bi zimanê keldanî ko

128

şêweyekî zimanê aramî yê Îsa pêxember û kitaba Încîle bû, destaneke

kevn ko gelekî bi hedîseke dînî dişibiya, lê tê de navê Gilgameş, Enkîdû,

Urx derbas dibû, jixweveçûyî, çavgirtî, serxweş digot. Heye ko ew şev, şe-

va herî xweş a Bedros bû, ji lewre ew li welatê hezar salan ê bav û kalên

xwe, li kahniya dewlemendî û medeniyeta kevntirîn a keldanan û herwe-

ha a însaniyetê bû. Ma Nînova, ne welatê wan ê destpêkê, bajarê wan ê

tarîxî bû? Ma ew gotinên ko Bedros hingê geh bi awayekî zîz û giran,  
geh  
bi navber û bîhnvedaneke dirêj digot û deng û pejnên tevgera  
wextê mî-  
na tevgera pêlên çêm, digîhande sifra me ya feqîr û ruhê me yê xort  
û har  
haş dikir, ne gotinên tarîxeke kevnare bûn?  
Ji bilî hin nav û gotinan, min ji strana Bedros tiştêkî fahm nedikir, lê  
dengê zîz ê Bedros û şêweyê gotina wî alîkariya min dikir ko ez  
bikaribim  
gotinên wî li bêjînga dil û ruhê xwe xim û jê stranek ko aîde min bû,  
min  
jê fahm dikir derxim. Heye ko strana Bedros çêla çemê Dîcleyê û  
keç û  
jinên ko li deverên sakîn ên çêm xwe dişuştin, dikir; heye ko  
dengbêjekî  
li bilûr an jî saza xwe dixist û çêla welatekî bextreş ko hertim di nav  
xwînê  
de bû û qedera wî windabûn bû, dikir, an jî stran ê qala însanên sil,  
sûzen  
û bîhteng ko şikestên xedar xwaribûn û nikarîbûn rîyeke rast  
bibînin û  
bidin ber xwe, dikir.  
Piştî ko Bedros destana xwe ya dirêj mîna stran got, ew sekinî. Di  
nav  
wan çilkên yekemîn ên tîrêjên tavê de, tevî ko min gelekî vexwaribû  
û  
xew li ser çavê min bû, çavê min bi çend rondikên ko li ser rûyê  
Bedros  
mîna libên lûlûyan dibiriqîn, ket.  
Birako, min gotê, ma gotinên strana te ewçend zîz bû?  
No, wî got, heye ko ew ne ewçend zîz bin, lê her cara ko ez wê  
dibêjim,

ez xerîbiya dayik û xwehên xwe ko hertim vê stranê ji min çêtir dibêjin, dikim.

Dê û xwehên te? Migo, ji bo ko tiştêkî bibêje û perda bêdengiyê yekcar biqelişîne, got.

Herê, Bedros, serê wî li ber wî, got. Ew li gund, li deverên Aşîta û Tiyariyê ne. Dayika min Tirma û xwehên min Sarah û Ester... Me bi hev

re ev stran digot û nemaze dengê xweha me ya biçûk Esterê di nav wan

çiya û geliyan de perde bi perde bilind dibû û mîna qedîfê li ruhê mirov

hukim dikir.

Ester, dengê Esterê, ez bi dengê bilind fikirîm û bi dû re min li Bedros

vegerand, dengê wê çawan e, ew çawan dibêje, çi dibêje, ji kengî ve?

Min ê pirs hîn direjtir bikirana, lê bi pîrçîna Bedros û Migo ez li xwe 129

warqilîm û min dengê xwe birî, lê navê Esterê ko bi dû re bû Stêr û mer-

aqa dengê wê hingê li dilê min hate kolan. Ma tovên evîneke abadîn bi

meraqeke kûr nayên avetin?

Sibeyeke nû dest pê dikir, diviya em rabûna. Migo û Bedros xwe dan hev, de rabe Biro, Migo gote min, em herin.

No, min gote wan, hûn herin, ez ê hinekî din jî rûnim. Dev ji sifrê jî berdîn, ez ê rakim.

Piştî ko ew tevî Gurzo çûn, min rûyê xwe dîsan ber bi Nînovayê ko di

bin axa reş de veşartîbû, kir û bi dîqet li girên Nînovayê nihêrt. Di bin



wan giran de çi veşartîbû? Ew çîrokên ko Tewrat û kitabên din ên olî dig-  
otin, rast bûn an bi tenê çîrok bûn? Ew şêrên yekta ko qalê dibûn û hema  
çi bigire remza hemû Mezopotamyayê bûn, bi tenê ji bo hişyarkirina meraqa însanan bûn an jî bi rastî ew di wextê xwe de hebûn? Kê,  
çawan  
Ninova ava kiribû, çawan ew hilweşiyabû û bi erdê ve bûbû yek?  
Şer,  
zelzele, tofan, nexweşî, xela?  
Nînova... ew avahiyên yekta yên hemû cîhanê, keleh, beden û bircên  
ko digihîştin asimanan, şaneşînên ko li ser ava Dîcleyê mîna bexçeyên  
cenetê bûn, qesr û qonaxên neqîşandî yên qralên mezin, kolanên fireh ko  
bi kemberan digihîştin hevûdu, reqaseyên ko di meclîsên zêrhêlî yên bê-  
er û ber de mîna şahmaranan xwe li ba dikirin... Nînova... ko êdî qulipîbû ser axake qirac ê bêber, ko êdî bûbû welatê mar, marîjok, gumgumok û başokeyan...  
Stêr çûn ava, tîrêj li pey bilindahiyên piştî Mûsilê hildihatin, ji bilî dengê quling û teyrên koçber, dîkên sibê û kelekvanên Dîcleyê, hê çu  
deng nîn bûn. Lê li milê din ê çêm, ji Nînovayê deng dihatin. Yên kê, çawan? Ez nizanim, bayekî sivik hedîka xufexuf, av mîna dengê kah-niyekê hêdîka xuşexuş dikir û ji girên Nînovayê, ji kevir û zinarên kilsî  
dengên têkel dihatin; orîna şêran, çerqîna şûran, hîrîna hespan, reprepa  
lingan, vizîna tîr û mirtalan, gumîna defan, hûfehûfa gulokên agiran, qîrîna şervanan, qîjîna zarokan, axîna pîrejînan, gotinên dengbêjan... Bi

lêdana tîrêjan, dengên Ninovayê jî bi ser min de hatin, guhên min  
bel,  
jixweçûyî, dest û milên min vekirî, çavê min girtî, min pejnên ko  
mîna  
pêlên Dîcleyê, bêrawest, di pey hev re, ji dewr û dewranên nenas  
dihatin,  
kite bi kite, hambêz kirin.  
Hingê tîrêj di ruhê min de jî vedan, hingê hemû dinya bû ya min...  
Dengê feqîr û qewlên êzidiyan, min dizanîbû, mîna dengên  
Nînovayê  
130  
û ji Nînovayê ne ewçend bi dûr, di newal û geliyên teng ên çiyayên  
Şengalê de, bêyî çu bendên dewr û dewranan, her û her diherikî.  
Min di-  
viya xwe bi wî dengê ko yek ji hedefên min ên esasî yên rêwîtiyê bû,  
bigîhanda.  
Êzidiyên deverên Bedir, Şengal û Lalişê, bi cil û bergên xwe yên  
taybetî  
yên spî, porê xwe yê gelekî dirêj, rîh û simbêlên xwe yên şehkirî, ji  
bo  
kirîn û firotinê, nemaze ji bo firotina heyinên çiyayê Şengalê, mîna  
gwîz,  
behîf, mewîj, tû û hêjîrên hişk, carina dihatin bazarên Mûsilê. Tevî  
ko ew  
ehlê navçê bûn û bi kurmanciyê zelal û xweşik dipeyivîn, mîna  
însanên  
xerîb, li ser rûyê wan hertim şopên şik, sûzenî û tirsekê diyar bû. Ew  
bi  
tevgera xwe bitevdîr, bi nêrîna xwe nerm, bi gotinên xwe nefsbîçûk  
bûn.  
Lê belê tevî vê yekê xelkê bajêr, nemaze zarok û xortên ehlê  
misilman,

mîna ko êzidî ji dinyayeke din û mehlûqatên neçê bin, heqaret li wan  
dikirin. Zarok diketin pey wan û diqîriyan;  
Kurên şeytên hatin, kurên şeytên...  
Rojek ji wan rojên me yên tiral ên Mûsilê ko êdî payîz ber bi çileyan  
diçû, lê hê jî dinya germ bû, danê sibê, piştî ko min û Migo ji Apê  
Yaqûb  
ko li nik necarekî qiraxên çem, kêleka keleka xwe ya nû ko necar jê  
re, bi  
hostahiyeke mezin çêkiribû, sekinîbû, xatir xwest û berê xwe da  
taxa ci-  
hûyan. Li rê, berî ko em bigihên taxê, em rastî êzidiyekî bûn. Bi qasî  
deh  
zarokan dor li êzidiyê reben girtibûn û bi qîreqîr heqaret lê dikirin.  
Êzidî  
ko navsale bû, telîsek li piştê, li dora xwe dizivirî û xwîdan li enî,  
rondik  
li ser çavan, bi lava, bi tenê digot,  
Zarokno mekin, bihêlin ez di riya xwe de herim...  
Bi leza birûskê em ketin nav zarokan, bi çend şeqamên ko diviya di  
rûyê Heme û Kamo de jî biteqiya, me zarok jê bi dûr xistin. Êzidiyê  
ko  
gelekî jar û kinik bû, ji kerban, bêdeng digiriya û diheziya. Min barê  
wî  
hilda û me ew jî bi xwe re bir qahwexanê. Navê wî Husên bû û ji  
deverên  
çiyayê Şengalê, gundê Sifnê bû, ji bo firotina hêjîrên hişk daketibû  
Mûsilê. Piştî ko ew hinekî sakîn bû, çaya xwe vexwar, cixara pêçayî  
ko  
min dabûyê, kêşand, bi rêzdarî, li me nihêrî û gote:  
Yezdanê dilovan ji we razî be, de ez herim sûkê û hêjîrên xwe  
bifroşim.

Ez ê hevalên xwe li xana nik deriyê Sîncarê bibînim, berî ko ew herin, di-

vê ez şixulê xwe bi ser xim.

Kekê Husên, Migo ko mîna her carê bîrbir û diltenik bû, gotê, ma tu ji

bo hêjîrên xwe çî dixwazî?

Bi çend pere jî ji daxwaza Husênê Sifnê zêdetir, Migo hêjîr kirîn da ko

131

wan yadîgarî dêra keldaniyan ko em lê mêvan bûn, bike. Bi dû bazara me

û Hûsên re, bîhna wî derket û çayeke din vexwar. Di wê navberê de, bêguman, min di derheqê wî, malbata wî, çiyayê Şengalê, Laliş, şêx û

pîrên êzidiyan, gelek tişt jê pirsîn. Ewî dil nîn bû ko bi dirêjî bersîva pirsên min bida, lê tevî vê, tiştine tevîhev û peregende bi kurtebirî gotin.

Çaxa wî çaya xwe xelas kir, qedeh danî ser masa gemarî ya biçûk ko lê

vizeviza mêşan bû, çavê wî li qedehê, bi dengê nerm û nizm gote me:

Eger rojî û cejn nêzîk nebûna, ez ê tu carî daneketima vî bajarê kambax

ko hertim dijminahiya me dike. Lê rojî û eyd li ber derî ne, zar û zêçan

zad û zexîre, cil û xirad divên.

Rojî kengî ye? Min tavilê jê pirsî.

Piştî hefteyekê ye.

Cejn kengî ye, çî cejn e?

Di pey rojên rojiyê re ye, cejna şêşims, ewî, bi meraq li min nihêrî û got,

paşê jî ew rabû ser piyan, pereyên xwe xiste bêrîka hundirîn a şepikê xwe,

ji me xatir xwest, da rê û çû.  
Gotinên Husên daxwaza min a bingehîn dîsan bi bîra min anî; min di-  
viya xwe bi reh û rêçên xwe, bi remz û sirên teyrê tawis bigîhanda.  
Ji vê  
çêtir hêncet nîn bû; roja cejna êzidiyan, diviya ez li Lalişê, dilê  
qewlên  
êzidiyan ko ji zaroktiyê û vir ve, min, geh bi dizî û veşartî, geh bi  
alîkariya  
gotin û remzan, hertim dibihîst û hîs dikir.  
Piştî şeş rojan, beriya roja yekemîn a rojiya şêşimsê, derengê danê  
sibê  
ko tucar, bazirgan û gundiyan êdî şixulên xwe yên sipêdê biribûn  
sêrî,  
tevî du êzidiyên xort ên çiyayê Şengalê ko bejna wan ji ya min jî  
dirêjtir  
bû û şixulê xwe li bajêr kuta kiribûn û vedigeriyan gundê xwe, li ser  
hes-  
pên rewan ên belek, me berê xwe da milê bakûr ê Mûsilê û di kêleka  
Dîcleyê re, em ber bi war û welatê êzidiyan bi rê ketin. Ji coşa min  
re  
payan nîn bû, roja ko min hema çî bigire hertim xeyal kiribû, di  
dawiya  
dawîn de hatibû. Bicîhbûna xeyalan mîna ava goleke ko di qijeqija  
havînê de bi kelê dikeve ye, heta av bi tîna tava germ negihîje  
dereceyekê,  
ew bi kelê nakeve. Lê gava ew hate dereca xwe, kel jê radibe. Wê  
rojê, ber  
bi nîvroyan, xeyalên min bi kelê ketibûn û kela xeyalan jî kela ruhê  
min  
rakiribû. Li ser hespekî bedew ê çiyayên Şengalê, boxçika min a cil  
û

bergan li pişta hesp, geh bi meşeke nerm, geh bi rewan, şal û şapikên paqij

ên Şengalê li min, di bêrika min de hinekî pere, titûna zer û heste, lingên

min li zengûyan, hevsar di destê min de, bala min li ser bilindahiyên Şengalê ko gav bi gav girstir dibûn, hûnikahiya bayekî sivik ê bakûr li ser

132

rûyê min, tîna sivik a tava payîzê li ser eniya min, kêfxweş, mesûd, min bi

hevriyên xwe, xortên êzidî ko navê wan Xidir û Hadî bû, sohbet dikir û

zahf tiştên ko min meraq dikirin, ji wan dipirsî.

Tevî ko Migo jî dil dikir bi min re bihata Lalişê, min xwest, ez bi tena serê xwe bûma da ko min hemû kitekitên reh û rêçên umrê xwe, hemû

pirsên dil û ruhê xwe, bi her şêweyî, bikaribûya bidîta, hîs bikira, li serê

bifikiriyama û heye ko dawiya dawîn bigihîştima netîceyekê. Dawiyê,

piştî xirecîreke du rojan, min Migo ko gelekî eciz bûbû û êdî dil dikir veg-

eriya Cizîrê, îkna kir ko ew li Mûsilê, li nik nasên Mam Sefo ko ermen bûn û hal û wextê wan gelekî xweş bû, bi cîh be û li hêviya min bimîne.

Piştî vegera min, me dê bida ser riya çem û em ê daketina Bexdayê. Mîna her êzidiyekî, dengê xortan jî baş bû û çaxa pirsên min hinekî kêmtir dibûn, li ser tikaya min, li rê, wan stran û qewlên êzidiyên Şengalê

ji min re digotin. Di wê rêwîtiyê de ez hîn bûm ko qewlekî êzidiyan ê ro-

jî û cejna şêşimşê jî hebû. Herdu xortan bi hev re, li ser hespên ko li pey

hev, bi gavên nerm, di nav dar û dahlan re diçûn, bi awazekî nerm,  
qewlê  
şêşimsê ko methiyeke dirêj a Yezdanê mezin bû, digotin;  
Ya Şêşims tu rehîm î  
Tu xaliqekî min î ji qedîm î  
Ya Şêşims ji hemû derdan re tu hekîm î...  
Pêşî em çûn gundê xortan ko li sînga çiyê, di dahldeyekê de, mîna  
hêlîneke qertelan vedayî bû û xaniyên gund hema çî bigire li ser hev  
siwar  
bûbûn, me firavîna xwe ya dereng ko ji tîkegoşt, savar û mehîrê  
hatibû  
pê, li ser banê xaniyekî ko jê hemû deşta zer mîna siniyeke zêrhêlî  
dixuya,  
xwar. Xort zewicîbûn û Xidir ko gelekî xort bû, ji niha ve, gihîştibû  
zaro-  
ka xwe ya sisiyan. Bi dû xwarinê û çayvexwarinê re, îcar hema çî  
bigire  
hemû gund bi me re, tevî zarok, kal û pîran, li ser pişta ker, bergîr û  
hes-  
pan, me berê xwe da geliyên ko di kûrahiyên çiyân de bûn û em  
dîsan bi  
rê ketin. Rûyê me ber bi geliyê Lalişê, warê miqedes ê hemû rojî û  
cejnan  
bû. Em ji deşta xopan a bi tîna tavê şewitî, toz û gemara erdê qiraç  
bi dûr  
ketibûn û hilkişiyabûn bilindahiyên çiyân û bihust bi bihust ketibûn  
nav  
dar, ber û hêşinahiyêke boş ko li gora gotinan warê hirç û pilingên  
yekta  
bû. Ji bilî jûjî, simore, kêwroşk û pezkoviyân, li rê em rastî gelek  
însan û  
komên din ên êzidiyan ko riya wan jî ber bi Lalişê bû, hatin. Herkes,

hemû êzidî, bi sedan heye ko bi hezaran, ji deverên Cizîra Botan,  
Wan û

133

Serhedan, Xerzan, welatê Qafqasê, beriya Mêrdînê, deşta  
Wêranşar û

Serêkahniyê, siwar an peya, têr an birçî, zarok an pîr, zînde yan  
nexweş,

tevî gotin, qewl û stranan, di ser newalên kûr, tahtên tûj û av û  
coyên şên

re, mîna lehiyeke ber bi geliyê Lalişê diherikîn. Rojî û cejna êzidiyan  
li dar

bû û wan ê di dilê dînê êzidiyan de cejna xwe pîroz bikira. Hema çî  
bigire

hemûyan qewlê ko xortan ji bo min gotibû, digotin û ber bi  
kûrahiyên

çiyê diçûn;

Ji derencê heta derincê,

Şêşims e xwidanê ferecê

Dest û damanê Şêşims radimîsim dewsa kabe, ciyê hecê...

Laliş ko ji çend avahiyên kevnare hatibû pê, di binê geliyekî kûr de,  
li

kêleka gewriyekî, bi ser zinêr de paldayî bû. Şêx Adî ko şêxê herî  
mezin ê

êzidiyan bû û li gora gotinên şêx û pîrên êzidiyan, berî niha bi qasî  
hezar,

hezar û du sed salan li Lalişê jiyabû, tevî çend şêx û pîrên din ên  
navdar,

li wir veşartîbû. Mîna niha tê bîra min, çaxa em daketin binê gelî û  
Laliş

ko însên dikarîbû di nav hemû zinar û tahtên doralî de bi tenê bi  
riyekê

xwe bigîhandayê, li me diyar bû, dilê min mîna çûkekî ko dixwest ji  
qe-



fesa xwe bifire, welê bi xurtî hilavêt. Ji her çar aliyên çiyê însan, di nav cil û bergên xwe yên spî de, bi gotina qewlê şêşimsê, qor bi qor, rêz bi rêz, li pey hev, ber bi avahiyan diçûn. Heta ko çav didît, her der însan bû, do-raliyên avahiyan, kêleka kahniyên ko diherikîn, binê dar û berên ko hawîrdor vegirtibûn, pal û quntarên çiyê, her der tijî bû. Herkesî li derekê, kom bi kom, konê xwe vedabû, çûl an jî kulavê xwe raxistibû û li ser axa Xwedê, mîna min, Biroyê sêwî, bûbû mêvanê Lalişê ko li gora qewlan gur û mîh bi hev re tê de diçêriyan. Xidir, Hadî, zarok û gundiyan wan li qûntarên zinarekî asê cîhekî fireh peyda kirin û li wir bi cîh bûn. Çu kesê min, an nasên min li wir nîn bûn, ji lewre ez jî tevî wan, bi civata wan, li ser kulavekî qehweyî, boxçika biçûk bahlîfa min, cilekî tenik lehîfa min, li kêleka coyeke biçûk ko ji kêrahîyên çiya diza, di bin siya dareke kal a tûyê ko êdî pelên xwe yên dawîn jî diweşand, bi cîh bûm. Ez, Biroyê sêwî, Biroyê kor, li wir, li nik wan bûm Biroyê êzidî. Ez hertim bi Xidir û Hadî re bûm, lê gundiyeke wan ko li Lalişê, li nik şêx û pîrên giregirên êzidiyan dima û qewal bû, li wir bû hevalê min ê mehên min ên Lalişê. Navê qewalê awazxweş Zerdeşt bû û umrê wî êdî mîna dara tûyê ko bi rehmet û siya xwe ez di-

134

hebandim, gihîştibû payîza xwe. Kekê Zerdeşt ko hertim digot, Lalişa

xweş, warê ewliya û embiya ne, bi zimanê xwe yê şêrîn, bi cil û bergên

xwe yên paqij ên spî, bi por û rîha xwe ya dirêj ko êdî bi temamî spî dikirin, bi mêvanperweriya xwe ya bêpayan, xwasî, lê hertim paqij û

şuştî, qewlek, rêzek an gotineke bav û kalan hertim li ser lêvan, bi sebreke

mezin, bû alîgirê min û pirsên min ên bêdawîn.

Belê, dawî li pirsên min nedihat; êzidî kî bûn, ji kû dihatin, dîne wan çi bû? Ew sir û sihêrên ko li dora wan û dîne wan bûn, çi bûn? Çima hîletê ehlên doralî ewçend ji êzidiyan diçû û dixwestin wan biqelînin? Çi-

ma ew hertim ji însanên din direviyan û war û welatê wan bi tenê zinar û

çiyayên asê, newal û geliyên teng û kûr bû? Û herweha hîn bi dehan,

sedan siwalên welê... Hingê ez li ser rê bûm, riya fetloke, zehmet, asê û bi

mij û dûman ko ez dikirim ez, Biroyê dengbêj. Ez gelek tişt hîn bûbûm,

min li Medresê gelek kitab xwendibûn, li civat û meclîsan li gelek alîm,

seyda û dengbêjan guhdarî kiribû, li kitابخana Mam Sefo, ji sûretên bêzar ên bêhejmar ên kitaban dengine zînde ko ruhê min terbiye dikirin,

afirandibûn û hertim min guh dabû dangan, lê belê ew hemû tiştên ko

min mîna kesekî birçî ko ji xelayê derketibe, bi lez û bez daqultandibûn,

nekemilîbûn. Min kemilandin diviya, lê çawan? Pirsên min ên Lalişê û

bersîvên Kekê Zerdeşt, ez bawer im, alîkarî kirin ko ez li ser riya xwe qon-

axeke nû herim û bêtir guh bidim dangan, hîs û serpêhatiyên.  
Tiştê yekemîn ko ez ji Kekê Zerdeşt, Xidir, Hadî û êzidiyên din hîn  
bûm, ev yeka hanê bû; tarîx û serpêhatiyên êzidiyan, hertim bi  
xwîn, jan,  
keser, tirs û neçariyê ve tijî bû. Hertim ew ji war û gundên xwe  
reviyabûn,  
hertim wan xwe spartibû warên asê da ko xwe ji şûr xelas bikin. Geh  
or-  
diyên osmaniyan ko bi xwînrijiya xwe nas in, bi serekiya paşayên ko  
Nemrûdên roja me ne, geh eşîrên doralî yên misilman ên kurd û  
ereban  
ko dijminên sondxwarî yên êzidiyan in, hertim êrîşên xedar biribûn  
ser  
êzidiyan û ew qir kiribûn. Ne carek du caran, ne salek du salan, ne  
heyamek du heyaman, lê hertim, di berf û baranê, di germ û tavê  
de, hem  
di wext û heyamên şer û pevçûnê, hem di yên aştî û sikûnetê de. Li  
wir,  
di wan rojên pîroz ên Lalişê de, rastiyeke kirêt, mîna tîreke jahrîn,  
dil û  
ruhê min sot; serpêhatiya hemû êzidiyan mîna hev bû, hemû jî, bi  
awayekî, ya rastirîn bi mûcizeyekê, ji şûr xelas bûbûn. Bav û kalên  
Xidir  
û Hadî li kêleka çemê Dîcleyê hatibûn kuştin û xwîna wan tevî ava  
Dîcleyê bûbû. Kekê Zerdeşt ko ji min dirêjtir, lê jartir bû, mîna min  
sêwî  
mabû, bav, de, bira û xwehên wî hemû hatibûn kuştin.  
135  
Yanî ew hemû mîna min bûn.  
An jî ez weha bibêjim; ew hemû Biro bûn, an bervajiyê wê, Biro, ew  
hemû bûn.  
Qewl, stran û gotinên êzidiyan, ên yêtim û sêwiyan bûn.

Tiştê duwemîn ko ez li wir hîn bûm, qîmet û hêza gotinê bû, ji ber  
ko  
gotin, qewl, stran, lavij, çîrok ji bo êzidiyan mîna melhemê bûn.  
Wekî ko  
ew pê birînên xwe bicebirînin, wan di keleberbanga sibê de, berê  
xwe ber  
bi tîrêjên yekemîn ên tava roja nû dikirin û dua dixwendin, danê  
sibê li  
ber deriyê gora Şêx Adî rêz dibûn, destê pîr, şêx û feqîrên xwe  
radimusîn  
û qewl digotin, danê êvarê, berî ko tav li milê rojava, li pey çiyê here  
ava,  
li dora Kahniya Spî ko kahniyeke miqedes bû û jê ava şîfadar a  
zemzemê  
diherikî û kahniyên din ên Lalişê dicivyan, tevî dengê bilûr, erbane,  
def  
û tembûran, li şêx û qewalên xwe guhdarî dikirin, çaxa ro diçû ava,  
wan  
dîsan berê xwe ber bi royê dikir û miraza dilê xwe mîna qewl û rêz  
dig-  
otin û êvaran jî, piştî şîvê, dîsan tevî bilûr û erbanan, li meydanên  
biçûk  
ên Lalişê, di bin ronahiya heyverona ko mîna gulokeke êgir diçirûsî,  
dest  
didan hev, zincîrên dirêj û gulover danîn pê û bi ahengeke têkûz,  
tevgereke geş, lebateke bi şox û şeng, geh bi lez, geh giran, lê bêyî  
ko di  
zîncîra govendkêşan de şaşiyek an çewtiyek hebe, tevgera her  
govendkêşî  
li gora ahenga civata govendê, heta derengê êvarê, bi ruh û xwîdan,  
jixw-  
eveçûyî, govend digirtin.

Ez têgihîştîm; gotin, qewl, bilûr, erbane, tembûr ji bo însanê êzidî  
hey-  
at bû, di şîn û tahziyan, dawet û dîlanan, rojî û cejnan, sefer û koçan  
de,  
wan her û her digotin û derbên xedar ên heyata wan ko bi tenê ji  
jan û ke-  
sereke kûr hatibû pê, bi alîkariya deng, gotin û awazê kêmtir dikirin.  
Qewlê dînî û bilûr û strana kurmancî hêzeke manewî dida êzidiyên  
ko  
hertim diperçiqîn û qir dibûn, da ko ew bikaribin, tevî hemû bela û  
mûsîbetan bijîn û gotina xwe bi nifşên nû bigihînin. Bilûr û erbana  
sade,  
li heyata wan a sade û li gotina wan a sade dihat. Çu kesî ji wan  
nexwendibû, li bajarên mezin mîna Stenbol, Heleb, Şam, Bexda,  
Tebrîz,  
Tehranê şêwe û celebên gotin û stranê nedîtibûn, lê tevî vê yekê  
her yek  
ji wan hosteyekî yekta yê gotin, stran û govendê bû. Mîna heyat û  
ser-  
pêhatiyên xwe, wan qewl, gotin û stranên xwe jî hertim dubare  
kiribûn û  
bi tecrubeyên heyatê hem bûbûn hosteyên veşartina sirên xwe  
hem jî  
hosteyên gotina zelal a qewlên êzidî.  
Biro, bavê mino, em bi dinyayê nikarin, Kekê Zerdeşt di sohbetên  
me  
yên êvaran de digot, lê em bi gotina xwe dikarin û em dizanin ko bi  
tenê  
136  
quweta gotinê dikare li hember quweta şûr û zilma nefretê  
bisekine. Ji bîr  
meke Biro, qerarên ko şûr didin, timî bi xwîn in.

Û ro, tîrêjen royê, tîna royê, siya royê, nûr, nûrahî, ronahî... tişteki  
din  
ko min li Lalişê çêtir fêm kir, pêwendiya êzidiyan û royê bû. Ro  
navenda  
heyata wan, bîr û baweriyên wan bû. Gotina şims ko wan hertim bi  
kar  
dianî û di qewlê Şêşimsê de derbas dibû, bi erebî ro bû, ferec jî  
ronahî bû.  
Piraniya gotin, qewl û ayetên wan li ser royê û ronahiya wê bû.  
Jixwe  
îbadetên wan jî bi hilhatina royê dest pê dikir, bi avaçûna royê  
temam  
dibû. Hem di hilhatina royê de, hem jî di avaçûna wê de wan rûyê  
xwe  
ber bi tavê dikir û qewl dixwendin. Di wan rojên rojî û cejnê de, bi  
hezaran însanên bindest û neçar ko xwe spartibûn cîhê herî asê yê  
dinyayê, di berbanga sibê de, rûyê wan ber bi tava ko li pey  
bilindahiyên  
çiyar hêdî bi hêdî bilind dibû, destê wan ber bi asimên, bi hev re,  
berge-  
heke welê dianîn pê ko ez ne bawer im, li dinyayê di dereke din de,  
berge-  
heke welê hebû.  
Bi tîrêjên yekemîn ên berbangê, bi dengê dîk û teyrên dar û dahlan  
re,  
hemû kes li ser piyan bûn. Feqîr û qewal di nav kon û koman de di-  
geriyan û bi dengê bilind qewlê gundiyan digotin;  
Cindiyo, rabe roj e  
Bes vê xewê hindoj e  
Xewa berê sibê zor edab û doj e.  
Şêxê mezintirîn ê êzidiyan, di destan de gopalê wî, cil û bergên spî  
lê, şêx,  
pîr, feqîr û qewal li doralî, rûyê wî ber bi tîrêjên tavê, li ber deriyên

avahiya Şêx Adî disekinî û qewlê sibehê digot;  
Nûr ji nûrê şifqî  
Siphan e, ji te xaliqî  
Melek e, li ber tifqî.  
Biro, bavê mino, Kekê Zerdeşt ku, piştî rojî û cejnê, nehîşt ez  
vegerim  
Mûsilê û li mala ko ew jî tê de dima, ez kirim mêvan, digote min, sî  
bi  
derketina xwe deyndarê tîrêjê ye. Însan, heyat û dinya bi hebûna  
xwe  
deyndarên royê ne. Ro dihebîne, dibexşîne, vedijîne. Xudavendê  
mezin  
erd çekir, asiman afirand, bi dû re ro bexşand. Royê jî tîr û tîrêjen  
xwe,  
ronî û nûra xwe bexşand me benî ademên dewranê.

137

Her tiştê ko pêwendiya wî bi royê re hebû, li ber dile êzidiyan şêrîn  
bû.  
Heta mar ko însan jê ewçend ditirsiya û direviya, ji bo wan, remzeke  
quweta royê bû. Ro hêz û quwetê dide mar, wan digot, gava ro heye  
û bi  
tîrêjên xwe piştî mar difirkîne, mar zindî ye, mar dijî, mar dibe mar.  
Rojî û cejn çûn, Xidir, Hadî û malbatên wan, gundî û heciyên êzidî  
çûn. Heyata Lalişê ko hertim bi dengê gotin, qewl û stranên însanan  
û  
xwendina çûk û teyran tijî bû, qulipî ser halê xwe yê berê. Roj, hefte,  
meh  
li pey hev çûn, lê ez li Lalişa ko ne mîna rojên rojî û cejnê, lê hertim  
tijî  
şênî bû, mam. Payîz qulipî ser zivistanê, zivistan ser çilê, çile ser  
biharê, lê  
ez her li gelî û newalên dinya veşartî ya êzidiyan ko tijî sir bû, bi roj,  
tevî

şervanên çekdar û xwedî tivingên helqedar ko sal donzde meh nobedarî  
li Laliş û gelî dikirin, li şikêr, zinar û daristanên Şengalê, tevî seg û tajiyan,  
li pey heywan û tilûrên nêçîrê, êvaran ko dibû kûzekûza gur, rûvî û wawîkan,  
li jûrên biçûk û tarî yên Lalişê, di bin şewqa qendîlan de, bi pîr,  
şêx, feqîr û qewalên êzidiyan re, bi dengê qewl û stranên êzidiyan, mîna  
ko ez li dinyayeke din bim, dijiyam. Deng, pêjn, hest, gotin û rêzên abadîn  
ên herî sade yên însên, li wir, bi hev re bûbûn yek û mîna şelaleyên  
her çar çemên ko di zikê Şengalê de derdiketin, dil û ruhê min dişuştin.  
Ne dewr û dewran mabû, ne jî war û mekan. Bila Migo li Mûsilê li hêviya  
min bûya, bila dinya derve bi teşqele û xirecirên xwe yên mal, milk, şan,  
şoretê bîhn li hevûdu biçikanda, min ne xem bû. Bila qeda li dinyayê û  
kîn û nefreta wê bihata! Li Lalişê di nav hizûreke abadîn de, bi tasek av,  
pariyek nan, kulmek mewîj û tû û çend hêjîr, bi tenê bi quweta gotinê  
bawer, rîheke dirêj li rûyê xwe yê birîndar ko hema çî bigire bi geliyê  
Lalişê dişibiya, zêdekirî, bi hez, arzû û kêfxweşiyê, min roj û şev li pey hev  
rêz dikirin. Şevên me jî li meclis û dîwanan ko ji mêvan, dengbêj û qe-  
walên dengxweş ên êzidiyan dihate pê, şevên yekta yên gotin û stranan  
bûn. Me xwe dispart şevên bêdeng, zelal, aram û ebedî yên Lalişê û bi



gotinê jan û keserên xwe melhem dikirin.  
Şevêk ji wan şevên me yê aram ko êdî bi bîhna giya, gul û kulîlkên  
bi-  
harê difûriya û bi hilhatina heyvê ronîtir dibû, piştî ko hemû mêvan  
û fe-  
qîr û qewal çûn û ez û Kekê Zerdeşt ko bûbû kekê min ê axretê, bi  
tenê  
man, mîna ko ewî fahm kiribe ko wexta min û xatirxwestinê êdî  
hatiye,  
west û heye ko keserek li ser rû, ji nişka ve, wî gote min,  
Biro, bavê mino, min dil heye yadîgarekê bidim te. Lê bi şertekî...  
Min dengê xwe nekir, ez westiyayî bûm, min bi ken lê nihêrî,  
kakilekî  
gwîzê ji siniya şêrînahiyên girt, xiste nav tasa hingiv û ew bir devê  
xwe.

138

Ma tu dê nepirsî ka yadîgar çî ye, şertê min çî ye? Wî, mîna ko hinekî  
eciz be, gote.

Gotina xweş bihara dilan e, kekê Zerdeşt, min lê vegerand, gotina  
te

têrî min dike, min gotê, bihar hatiye û gotina te bihara dilan e, ji  
çend

mehan û vir ve te dilê min kir bexçê gulan ê biharê û ev jî têra min  
û heft

bavê min dike. Tu berxwedâr bî.

Wî dengê xwe nekir, rabû ser piyan, qendîl ji dîwêr hilda û çû aliyê  
hundir ê feqîrxana ko ji çend jûran hatibû pê û ez, ew û çend feqîr  
û qe-

walên din tê de diman. Piştî bîskekê ew vegeriya, qendîl bi dîwer ve  
kir,

rûnişt, çog avêt ser çogê, bi dîqet li min nihêrî û gote min,

Em êdî birakên hevûdu yê axretê ne, hem li vê dinyayê, hem li wê

dinyayê, hem li ser Pira sor, hem jî li heyata pey vê heyatê, em ê her bi hev re bin. Ez ê niha tiştê xwe yê herî giranbiha ko pîrê ko ez li ber destê wî mezin bûbûm û ez anîbûm Lalişê, dabû min, bidim te; teyrê tawis ko remza melekê tawis e. Di kitaba me Mishefa Reş de tê gotin, Xwedavendê me pêşî milyaket afirandin ko melekê tawis mezinê wan e û bi dû re dinya li ser pişta melekê tawis mîna lûlûyekê xaliq kir. Paşê jî erd û asiman, heyv û ro... Wî destê xwe yê rastê dirêjî min kir û kefa destê xwe vekir. Tê de kevirê sedef ko bi qasî gwîzekê lê pahn û gulover bû û bi çilkên ronahiya qendîlê diçirûsî, hebû. Jora kêvir bi quleke biçûk vekolayî bû û tê re benekî çermîn derbaskirî bû da ko meriv bikaribûya wê mîna nivîstekê bi stûyê xwe ve kira. Min kevir ji destê wî wergirt û lê nihêrî. Şeklekî xweşik ê teyrê tawis lê kolayî bû. Teyrê tawis, bi stûyê xwe yê bilind, tarrik û nikilê xwe yê dirêj, çîpên xwe yên mîna mirtal û pûrt û dûvikê ko mîna kevanekî ber bi jor vekîşiyayî, bi hostehî, li ser kevirê spî neqîşandî bû. Şertê min jî ev e, ewî du lib hejîr bire devê xwe û bi rûyekî geş got, çu divê tu carî teyrê me nedî kesekî din, ew divê hertim li nik te be. Lê belê, eger hezkar û evîndareke te hebe, rojekê tu pê re heyata xwe bikî yek û tu li qada dinyayê ji herkesî bêtir ji wê evîn û evindara xwe hez bikî û nûra evînê di dilê te de vede, hingê tu dikarî teyrê me bidî wê jî. Lê bi tenê wê û ne hîç kesekî din. Herçî ez im, min evîneke weha bi dest nexist, lê daxwaza min ji melekê tawis ew e ko tu bi dest xî. Melekê tawis nikare te hertim, li her derê biparêze, lê ew ê hertim li qada dinya kambax ko êdî bi temamî tijî şaşî ye û kîn û nefretê rê li ber însanan xwar kiriye, riya rast nîşanî te bide.

Min dengê xwe nekir, lê kevir bir ser lêvên xwe, ew ramûsî, bi qasî çen-

139

dekê lê nihêrî. Kevirê biçûk ê sar ko wê nîve şevê, heye ko li ber destê sibê,

bi ronîya qendîlê dibiriqî û mîna qedîfê dûz bû, aramî û germahiyeye

ruhî vediguhest însên û tevî ko ez westiyayî û ji dûmana cixare û qelûnê

û bêxewiyê sersem bûm, min xwe zînde û kêfxweş hîs kir. Min teyrê taw-

is dîsan ramûsî û ew bir stûyê xwe û pê ve kir.

Serpêhatiya min û kevirê sedef ê teyrê tawis ko ez ê, di şevên bê de, bi

kitekit qalê bikim, direj e. Lê ji niha ve ez bibêjim we ko kevirê teyrê taw-

is ê Kekê Zerdeşt, li Şamê, warê me yê nefiyê, alîkariya min kir ko ez

qatilê evindara xwe Stêrê ko bi derbên xencereke bêwîjdan hate kuştin,

binasim û tola Stêra xwe ya bêsiud û bêmiraz bi eynî xencerê xwînrij hildim.

Lê wê şevê, piştî ko Kekê Zerdeşt razên dilê xwe ji min re gotin û kevirê

xwe yê giranbiha da min, berî ko em rabin û herin bikevin nav cîhan, wî

destê xwe yê rastê bir ser milê min û bi dengêkî zîz ji min pirsî,

Biro, bavê mino, bav û kalên me gotine, birîna ko neye vedanê, rehet

nabe... meroqeke min heye, ma tu nabêjî min, ka ev birîna li ser rûyê te

ko diyar e birîna şûr an xencerekê ye, ji kû ye, ji kengî ye? Kê çavê te kor

kir?

Birînên me hemûyan hene, kekê min ê delal, min gotê, em ehlê birînên

kûr in, birînên me, carina mîna birînên min li ser rû ne, carina mîna birînên te li ser dil û ruh in... Birînên min... ew berî ko ez bîr bi heyaman

bibim, hatine vedan, nayê bîra min ka kengî bû.

Û ez giriyam.

Dengê bêdengiyê ko warekî vegirt, êdî zû bi zû ji wir dernakeve.

Heke

dengê bêdengiyê ji şopên birînên kûr hatibe pê, hingê bêdengî dibe îlele-

bet. Hingê bêdengî di nav her celeb dengê heyatê de, mîna çemê ko di

bin qeşayên çilê de diherike, mecrayeke xas dibîne û tê de her û her olan

dide. Lê belê olaneke welê ko bi tenê dil û ruh dikarin wê bibihîsin.

Her

cara ko min dil kir ko bi dengên heyatê û bi dengên ko hertim li dora dengbêjekî ne, dengê bêdengiyê ji bîr bikim, çavê min ê kor û rûye min

ê qelişî dengê bêdengiyê anîn bîra min. Roj bi roj, sal bi sal hîn bêtir...

herçend umrê min kemilî û gihîşte qonaxên nû, dengê bêdengiyê jî ewçend dil û ruhê min guvaşt.

Guhdarên qedirbilind, xortên delal,

Min ê ji kê re bigota ko dilê min bi liyan bû û her bêdengiyekê nîşana dengên ko nayên gotinê bû?

140

Ez ê niha çawan ji we re bibêjim ko bi çêla pirsê Kekê Zerdeşt re, niha

dîsan dilê min liyan e, dîsan wext wexta dengên bedengiyê ye?

Heye ko ji ber dengê bêdengî û olana wî ye ka ez bûm dengbêj û  
min  
gotin kire para heyata xwe. Heye ko loma ez weha rûniştîme, tevî  
birînên  
min ko min gav bi gav dibin gorê, heta berbangan, ji we re kitekitên  
tarîx-  
eke kirêt û heyatên şikestî dibêjim. Tarîxeke kirêt û heyatên şikestî  
ko ji  
jan, keser, hesret, sûzenî, ketin, bêgavî ko bi gotinê nayên zimên,  
ko dib-  
in hîmên bêdengiyê, hatine pê...  
Guhdarno,  
Ma jan, keser û hesret jî mîna kêfxweşî şox û şengê ne hewcedarên  
got-  
inê ne? Ma jan û kêfxweşî, keser û bextiyarî, hesret û mesûdî ne  
cêwî ne?  
Ma gotina min a destpêkê ya şevbuhêrka me ya yekemîn nayê bîra  
we;  
dengê jibîrbûyîyan... Yanî dengê bêdengiyê...  
Heye ko ji lewre, ko ez bikaribim ji dengê bedengiyê re awazekê  
bibîn-  
im, ez bûm bendî gotinê. Gotina ko hatiye hûnandin, bi deng û  
awezekê  
ko tê de bêdengî jî xwedî deng e.  
Bêdengiya ko piştî derba şûr an jî pirsên li ser derba şûr hatiye pê,  
bi çu  
bêdengiyên din naşibe. Bêdengiya derba şûr xurt, kûr û jîndar e.  
Belê,  
jîndar, bêdengiyêke welê ko çu carê namire. Bêdengiyêke welê ko  
mîna  
loriya pîrejinên ko li şîn û tahziyan rûniştine, her di dil û ruh de  
dihêni-  
je.

Mîna niha...

Bi dû dengê şûr re bêdengî.

Axur bêdeng, kadîn bêdeng.

Bav, dê û hersê zarok bêdeng.

Hewş, gund, hawîrdor bêdeng.

Ne teyr û tilûrek

Ne heywan û rawirek

Ne jin û mêrek

Ne zarok û kalemêrek

Mal û jûrên ko bi germahiya însên tijî bûn û do jê deng dihatin,

Kahniya ko bi destê hosteyên kevnare lêbûbû û do diherikî,

Xanî û dîwarên ko bi kevirên ferîşî yê reş lêbûbûn,

Dar û daristanên ko warê seydên ask û xezalan bûn,

141

Newal û geliyên ko bi dengê qewl û stranê olan didan,

Dîwan û meclisên ko bi dengê stran û qewlan germ dibûn,

Kalên rîhspî ko dewr û dewran dîtibûn,

Zarokên biçûk ko hê bîr bi çerxa dewr û dewranan nedibirin,

Her yek xwedî canekî, umrekî, heyatekê,

Her yek xwedî navekî, şan û bavikekî.

Gundê ko ji sedan salan û vir ve nas,

Bav û kalên veşartî, li goristana gund a nas,

Dar û berên ko bi destê bav û kalan çandî û nas,

Rez û bexçeyên ko bi tecrube û xatireyên bav û kalan ve nas,

Bav, dê, bira, birazî, xal, xwarzî, heval, dost, hemû nas,

Heta do, hemû bi hev re, bi ked û xwîdan, xewn û xeyal,

Bi heyateke nas.

Hemû niha bi bêdengiyê nenas,

Ku ji bêdengiya goristanê kûrtir, ji bêdengiya deryayan boştir,

Li ber bayekî sivik ê sibeheke ronî,

Geh li vir, geh li wir.

Derba şûr û mohra mirinê; bêdengî, bi tamamî bêdengî...

Lê bi dû bêdengiya dirêj a boş re, mîna mûcîzeyekê, carina

dengekî zirav, pêjneke sivik.  
Mîna simbilekî jar ko li pey qimilê maye,  
Mîna kevirê stûna pirekê ko li ber lehiyekî rabûyî çûye,  
Mîna çivîkekê ko ji hêlîna xwe ketiye,  
Mîna qulingê perşikestî ko li pey refê xwe ko di nav gulokên  
pûk û bahozê de windabûyî, maye.  
Û mûcîze; li kadînê,  
Di nav ka de ko bi xwîna însên renk guheriye, deng û pejn  
Nalîna zarokê berşîr  
Axîna dayika wî...  
Dengek, li pey her tiştî dîsan dengek...  
Dengê Bexda û Babîlê, bêguman ji dengê Lalişê ko yekcar dil û ruhê  
min  
142  
vegirtibû, gelekî cihê bû. Herwekî dengê însanan, dengên cîh û  
waran jî  
xweser in. Her war, welat û dever xwedî dengekî xas e, ko tê de  
hemû ser-  
pêhatî, tecrube û tarîxa navçê heye. Welatê êzidiyan ko xwedî  
dengekî  
gelekî taybetî yê kevnare bû, li ser riya terbiyekirina ruhê min, bû  
medreseyeke nû, lê belê ji Laliş û dengê Lalişê êdî wexta  
xatirxwestinê  
hatibû. Ez, Biroyê êzidî, rêwingê dinyê, diviya di riya qedera xwe ya  
neçar  
î teres de biçûma û min riyên nû ko carina kaş an nişîv, carina  
fetloke an  
yekpê, carina jî kor an xaç dibûn, bibiriya, qonaxên nû ko carina tê  
de bi  
tenê dengê kundan dihate bihîstin û carina jî tê de dengên têkel ên  
ser-  
pêhatiyên însanî olan didan, bida ber xwe. Hîn gelek war û welatên  
ko

min nedinasîn û bi dengên însan, bûyer, serpehatî û tarixê ve tijî  
bûn, li  
hêviya min, li hêviya ruhê min ê qeşmer û fikir û gumanên min ên  
zarok  
bûn.  
Piştî ko min kelîjana havîna Mezopotamya Jorîn jî li geliyê Lalişê ko  
li  
gora Mûsil û deverên din ên şewitî hûniktir bû, bihurand, min dîsan  
da  
rê, di sibeheke ronî ya destpêka payîzê de, berî ko ro li me hilwere,  
li ser  
hespekî rewan ê kumêt, tevî qewalê denghevrêşim kek Zerdeşt û  
ew her-  
du xortên ko di çûyina min de, ji Mûsilê heta Lalişê, bi min re bûn,  
Xidir  
û Hadî, kevirê sedef ê teyrê tawis ko êdî mîna birînên rûyê min bûbû  
perçeyekî heyata min, li stûyê min, em ketin rê, me ji Laliş, çiya, gelî  
û  
daristanên aram û ji teşqele û xirecirên însanan dûr xatir xwestin,  
berê  
xwe da çola qiraç a Musil û Nînovayê ko mîna her carê di xewa xwe  
ya  
tiral a hezaran salan de bûn. Li Mûsil û Nînovayê hîç çu guherîn nîn  
bû,  
heke em toz û gemara ko qateke din li toz û gemara wextê qedîm ê  
herêmê zêde kiribû, nehesibînin. Dicle bi şeweyê xwe yê nas, bi  
tevgerên  
giran ên fetloke di çola şewitî de diherikî; bayê sivik û germ ê şerqê  
mîna  
alawên agirekî nûpêketî rûyê însên mist dida; teyrên başoke bi  
tevgerên  
giran li doralîyên çem û girikên Nînovayê, bêmebest, li asimanên  
şîn ko



carina bi ewrên spî dineqîşîn, çerx dibûn; dûpişk, mar û marîjok,  
tîrêjên

tîn ên tavê li ser pişta wan, di navbera kuç û kevirên Nînovaya şewitî  
de

hêdîka, çiv didan; kelek û keştiyên biçûk li ser ava Dîcleyê ya sakîn,  
mî-

na pez û dewarên li qiraxên çê m ko bi germahiya tavê gêj bûbûn,  
giran

giran xwe dilivandin; qahwexane dîsan, bi dûmaneke giran a cixare,  
qelûn û nêrgilê, bi vizeviza mêş û pêşiyên û bi qîreqîra tucar û  
sîmsarên

hîlebaz ko kesî nizanîbû ka bezê guhê bavê wan ji kû bû û bi hezar  
fen û

dolaban kaya şil û giyayê ter bi buhayê zêran difirotin gundiyên  
doralî, ti-

jî bûn; dengên zimanên curbicur ên dêrên têkel ên filehan,  
mizgeftên

143

têkel ên şafî û henifiyên misilmanan û hewrayên cihûyan li bin guhê  
hev

diketin. Qayikxaneyên li kêleka çê m, dûkanên bazarên, meydanên  
kirîn

û firotinê, xanên kevnare yên kerwanên dûr û nêzîk ko ji bilî  
domandina

heyata rojane bi kêrî çu tiştî nedihatin, mîna tîmsalên heyata rengîn  
a

Mezopotamya Jorîn ko ji zanîn û şîûra xwe ya tarîxî bi dûr ketibû,  
şên û

geş bûn. Mûsilê, bajarê qedîm ê tarîxê, mîna her carê, bêyî ko haya  
wî ji

tarîxê hebe, di wexteke tarîxî de, heyameke nû li tarîxê zêde dikir.

Lê belê, li wir, însanekî ko bîr bi van hemû tiştan dibir û bi sebir, li

hêviya hatina min bû, hebû; Migo. Herçiças ew bi min re nehatibû  
Lalişê  
û heyata Lalişê ko bi qewlên êzidiyan hatibû hûnandin, xetim  
nekiribû,  
ewî li Mûsilê, li gora xwe, şêweyên din ên heyatê, ko bi huwiyeta wî  
ya er-  
men û bi dînê wî yê xiristiyanî ve gelekî girêdayîbû, xetim kiribû. Wî  
jî  
mîna min, mîna nîşana heyama nû ya heyata me ko bi şopên tarîxî  
yên  
çemê Dîcleyê li ser rêwîtiyeke xas bû, rîh berdabû. Lê rîha min ko  
eybên  
rûyê min hinekî vedişartin, mîna rîha feqîr û qewalên êzidiyan dirêj  
û  
şehkirî, rîha Migo ko ji bervajiyê rîha min, bal û endama wî ya girs  
temam dikir, mîna keşeyên dêra ermenan kurt û hinekî gulover bû.  
Ez  
dirêj, rîha min dirêj; Migo gulover, rîha wî gulover bû.  
Çaxê êvarê ez, tevî hevalên xwe yên rê, çûm dêra ermenan û di  
dersx-  
ana dêrê de min Migo ko di nav refên kitabana de bi tenê bû û li ber  
rehleyekê, di bin ronahiya qendîlekê û sûretekê Îsa Mesîh de, serê  
wî li ber  
kitabeke vekirî, dinihwirî, dît û me, mîna ko Dîcle û Firat bi hev re  
bibe  
yek, welê tavişê xwe avêt hembêza hev, hingê ne bi tenê zikên me  
yên ko  
êdî mîna defekî werimîbûn, herweha mûyên reş ên rîhên me jî  
gihîştine  
hev û hevûdu ramûsandin. Dest û milên malmîratê Migo bûbûn  
mîna  
mengeneyekê hesinî ko ne bi tenê dikarîbû nefesê li min biçikanda  
û be-

dena min a dirêj biguvişanda, herweha wî dikaribû, ez bawer im,  
kolozên

pola jî mîna rîsên giya li hev bada.

Lawo, hêdî be, min gotê, te kezeba min di devê min re anî.

Kuro, tu û kezeba te! Kezebreşo, tu li kû yî? Ewî hinekî esebî li min  
vegerand.

Ev çi halê te ye? Ev rîh, ev zik, ev qelawî. Tu dê biteqî, malmîrato!

Min

gotê û rê li axaftina wî girt.

Min dizanîbû ko min wî bi mehan, bi tenê hîştibû û mîna ewrên avis  
ên asimanan ko li hêviya bayekî sivik bûn da ko xurt bibarin, ew eciz  
bû

û li hêncetekê digeriya ko ne bi tenê bibare, lê belê mîna şêrekî  
biore jî.

Mîna ko ewî niyeta min fahm kiribe, ew hinekî ji min bi dûr ket,  
çavek

144

li hevalên min gerand, mîna ko ew ji wan hinekî fedî bike, dîsan  
awireke

sar da min û hêrsbûyî, lê îcar bi dengekî nermtir li min vegerand.

Biro, kezebreşo, ma ez te nas nakim? Tu niha dîsan dixwazî kîrê  
devan

li qûna pisîkan rast bikî!

Bi vê gotinê pîrqînî bi min û hevalên min ket û ez ber bi wî çûm û  
îcar

min ew pihêt hembêz kir.

Em li hev hatibûn.

Dotira rojê ewî bi kitekit behsa heyata xwe ya Mûsilê û wan mehên  
xwe, min jî behsa Lalişê, êzidiyan, qewl û stranên wan kir. Bi hemû  
tefer-

uatan, bêyî ko ne ew, ne jî ez, em serpêhatî, fikir, bûyer an jî  
kiteyekê ji

bîr bikin. Bêguman min qewl, hedîs û stranên ko ez li Lalişê hîn  
bûbûm,  
jê re geh mîna stran geh mîna gotin, yek bi yek, jiber, vegotin û  
kevirê  
xwe yê sedefê ko li gora qewlê Kekê Zerdeşt, ew ê di rojên min teng  
û  
neçê de alîkariya min bikira û di stûyê min de mîna nîşana  
payebilindiyeke mezin li ba dibû, berpêşî wî kir. Çaxa min di  
berbangeke  
sibeyeke zelal de, li mêvanxana dêra ermenan ko Migo jî êdî li wir,  
li nik  
min bû, di nav cîhan de, çîroka xwe û Lalişê bire serî, berî ko em  
bikevin  
xewê, mîna lorînekê, min rêzên dawîn ên Qewlê Şêşimsê jê re  
xwendin;  
Xwidanê keremê, dêrşê geliyê Lalişê,  
Meded halî sinetê,  
Tu bangî rehmetê,  
Rehme li dê û bavên hadiran û guhdaran...  
Herçî Migo bû, wî jî mîna min, heye ko ji min jî zêdetir, bala xwe  
dabû  
ser tiştên nû û li ber destên keşeyên dêrê Tewrat, Zebûr û Încîl ji nû  
ve  
xetim kiribû, li ser medeniyeta Urartûya ko mîratên bav û kalên wî  
bûn,  
gelek weşanên ko di kitabxana dêrê de bû, xwendibûn, îlmê xwe yê  
zi-  
manê ermenî bi pêş de biribû, hinekî bi ermeniya kevnare ko wî jê  
re dig-  
ot, krapar, hîn bûbû, mîna şalûrekê bi ermeniya nû ko jê re digot,  
aşkara-  
par, dipeyvî, li ser elifbêya ermenî ko beriya wextê me bi qasî hezar  
û çar

sed salan, ji aliyê keşe Mesrob Maşdots ve hatibû pê, hûr bûbû, şîr  
û  
stranên şairên navdar ên ermenan mîna Nerses Şnorhali û Sayat  
Nova ji  
ber kiribûn û di wê navberê de çend caran çûbû welatê Aşûr û  
Nemrûdê.  
Çaxa me êvaran xwe dîsan dispart bilindahiyên keleha Mûsil û  
keleha  
Selçuqiyân û dest bi xwarin û vexwarinê dikir, piştî bîskekê, bi dû  
çend  
îskanan re, di bin xalîçeya ronî ya stêran de, bi hevaltiya dengê  
segên ba-  
145  
jêr û kundên Nînovayê, Migo dest pê dikir û mîna ko ewî dixwest  
dengê  
xwe bigihîne kûrahiyên ruhê Nînovayê, bi dengê gelek berz,  
rêzine ji  
Tewratê ko wî ji ber kiribûn û çêla Nînovayê dikirin, nîvco û  
peregende  
dixwendin;  
Ho, tu, bajarê xwelî li serê barî!.. war û welatê derew, keleporek  
talanê...  
dengê qamçiyân, hîrehîra hespan, şîrqîniya şûran, vizeviza rîman,  
axîna  
birîndaran, cendekên behejmar ên miriyân... ho, bajarê ehlîkêf...  
derman  
nîn e... birînen te dê çu carê necebirin...  
Piştî demeke dirêj li Musil û der û dorên Musilê, me diviya dîsan  
xwe  
bida hev û em bi rê ketina. Mam Sefo ko haya wî hertim ji me hebû  
û ji  
dûr ve xwedîtî li me dikir, dîsan, kêsekî mezin tijî mecîdiyên osmanî  
û

kîsekî biçûk jî tijî zêrên biçûk, tevî Apê Yaqûb ko di navbera Musil û Cizîrê de, bi keleka xwe ya nû bar û rêwî dibirin û dianîn, şandibû. Me dirav, cil û berg, xwarin û vexwarin, nas û dost hebûn. Me xîret, bîr û bawerî, meraq û berpirsiyarî hebû. Zikê me têr, umrê me kamil, lê heya-ta me xort, armanca me bilind, hedefa me kûr û dûr bû. Me diviya berê xwe bida oxirê û xwe bisparta axên nû, îklîmên nû, dengên nû. Me pêdivî û tevdîrên xwe, li ser dûkan û bazarên Mûsilê, yek bi yek bi cîh anîn û boxçikên xwe hazir kirin, ji heval û dostên ko bi mêvanperw-eriyêke bêpayan rabûbûn û em li mal, meclîs û mêvanxaneyên xwe hewandibûn xatir xwestin, du şevbuhêrkên bi şox û şeng, yek li mêvanx-ana dêra keldanan, yek jî li ya ermenan li dar xistin û di berbangeke payîzê de, berî ko çilka tîrêjên tavê bikeve zikê dinyayê, tevî kerwanekî boş ê erebên bazirgan ko ji deverên Rihayê dihat û ber bi Basrayê diçû, li ser piştta du hespên esîl ko me ji axura dêra ermenan deyn kiribûn û di vegeerê de me dê teslîmî wan bikira, em bi rê ketin. Lê berî ko em bi rê kevin, em daketin qiraxên çem û çûn nik Apê Yaqûb ko ji bo çend rojan hatibû Mûsilê. Apê Yaqûb, li kêleka wî jî dostê me, segê fedekar û bîrbir Gurzo ko disan dûv û qamîşê wî yê sor rep, li qayikxanê, li kêleka dûkên, li ser kursiyekî gelekî nizm rûniştibû û çay

vedixwar. Gurzo em nasîbûn, çawan çavê wî bi me ket, tavi lê, ew  
rabû û  
şên, bi kêf ber bi me hat û mîna nîşana kêfxweşiya wî, ewî xwe avête  
ser  
me.  
De bihewe Gurzo, Migo, hinekî esebî qîriya ser Gurzo, lawo, ma tu  
dê  
bikutî me?  
Piştî ko Gurzo hinekî haş bû, kenek li ser rûyê me, em jî li kêleka Apê  
Yaqûb, li ser kursiyan rûniştin û me dest bi sohbetê kir. Migo dê  
146  
nameyek ko ji bavê xwe re nivisîbû, bidayê û em ê ji bo rêwingiyê  
pê  
bişêwiriya. Piştî bûyera kelekê, hem çavê min hem jî çavê Migo ji  
rêwingiya kelek û keştiyan tirsiyabû. Bi tenê du rê hebûn, riya çêm  
û heke  
riya avê nebûya hingê me riya bejê, riya kerwanan diviya. Gerçî Apê  
Yaqûb tênedigihîşt ka me li wî welatê başûr ê çol û heriyê çî diviya,  
lê ew  
jî di wê baweriyê de bû ko îcar riya kerwanan ê ji bo me çêtir bûya.  
Bi tenê  
şîreteke wî li me hebû; di welatê çol û xezebê de her tişt dikarîbu bi  
serê  
me de bihata, rê bi keleşên bedewî ko birçî bûn û li pariyek nan  
digeriyan,  
çeteyên osmanî ko ji eskeriyê reviyabûn, mar û dûpişkên ko bi tîna  
tavê  
har bûbûn, tucar û bazirganên ko heyata wan dek û dolab bû,  
gundiyên  
ko daxwaza dilê wan û gotina devê wan ne mîna hev bû, tijî bû,  
diviya em  
bi tevdîr bûna, em diviya ne peya, lê siwar bûna û hespên me jî  
diviya es-

Îl bûna.

Xortino ji bîr mekin, wî gote me, hespên esîl siwarên xwe di rê de nahêlin.

Berî ko em jê xatir bixwazin, piştî qulta dawîn a çayê, min jê kurê wî,

hevriyê me yê rêwîtiya kambax a Dîcleyê Bedros pirsî.

Bedros çûye gund, wî got. Ew çûye nik dê û xwehên xwe. Xweha wî Ester hinekî nexweş bû.

Min navê Esterê ko paşê bû stêra ber dilê min, hingê cara duwemîn, îcar ji devê bavê wê, bihîst.

Ester, Estera dengşalûr? Min jê pirsî.

Belê, Ester... tu ji kû dizanî ko dengê wê xweş e? Destê wî yê rastê li ser

simbêlên wî yên boq, meraqek li ser rûyê wî, wî li min vegehand.

Bedros gotibû, min bi kurtebirî gotê û em rabûn ser piyan da ko di riya

xwe de herin.

Dotira rojê, çaxa me di kêleka çem re, tevî kerwanê dirêj ko hema çî bi-

gire ji deveyan hatibû pê û bazirganên ereb ên jêhatî û xwedantecrube,

dest bi rêwîtiya xwe kir, ji kêfa min re payan nîn bû; hespê min ê nûti-

markirî, mîna ko ew di govendê de be, bi aheng diçû, çavê min geh li ser

deşta zer a bêdawîn ko leylan dida, geh li ser çemê Dîcleyê ko kirasê navçê

li xwe kiribû û bi renekî zer î zêrîn diherikî, min hêdîka strana ko min

di wê danê sibê de, ji nişka ve li hev anîbû û xwesteka ruhê min bû, dilo-

rand;

Esterê, lê Esterê



Zarşêrînê, lê keçê

147

Bilbila welatê Hekarê

Esterê, lê Esterê...

Min dil nîn e ko ez niha vê gera me ko bi dû re bû tecrubeyeke girîng  
a

heyata me, ji we re, tevî hemû kitekitan şerh bikim, ji ber ko min hê  
gelek

tişt û bûyerên girîng hene ko ji we re bibêjim. Lê heke ez bi kurtî  
çêla vê

gava diduyan a gera me ko îcar jî bi qasî sê-çar mehan dewam kir,  
bikim,

hingê ez divê bibêjim ko min û Migo xwe gîhand kahniya însaniyetê,  
dilê

hemû medeniyetên însanan, – bêyî ko em pêrgî qeza û belayên  
mezin

werin. Em ji Musilê derketin û hertim di kêleka Dîcleyê re, carina jê  
hinekî bi dûr, carina li nik, ber bi başûr, welatê çol û germê, gav bi  
gav,

roj bi roj daketin. Kerwan hêdî diçû, dengê hesab, xirecir, pevçûn,  
stran

û henekên bazirganên ereb li bin guhê hev diketin. Bi rojê, nemaze  
gava

tav bilind dibû, tîna tavê leylan dida û hawîrdor diqulipand ser  
deşteke

rût a çîk î zer û êvaran dinya diqulipî ser mehfûreke neqîşandî ya  
welatê

Wanê û stêrên çirûsî ko mîna çiyayê abadîn ê Cûdiyê aram, qehîm  
û ronî

di zikê asimanan de radiwestiyan, geh ronahiyeke ecêb xurt  
direşandin

ser dinyê geh jî mîna ko ew bixwazin ders û tecrubeyên çerxa felekê  
nîşanî

me însanan bidin, mîna ko ew bibêjin, umrê însanan jî weha ye,  
dirijyan

û ji milekî ber bi milekî din dixuricîn û winda dibûn. Li hemû dinyayê,  
li deverên cihê ko umrê min tê re boriye, min mehfûra neqîsandî ya  
stêran hertim dîtiye, lê ne bi wê ecêba welatê başûr ê çolê. Li wir  
stêr

gelekî nezîkî me bûn, mîna ko ew li ser serê me hilawestibin û çêla  
hal û

hewalê me bikin, bi me re bûn û tevî me bi kerwanê re dimeşyan.  
Her gava ko me davêt, her qonaxa ko me dibirî, tijî deng bûn,  
dengên

tarîxî û jibîrbûyî ko ji bilî min û Migo kesekî din seh nedikirin. Em  
daketin welatê xopan ê Nemrûdê ko di Tewratê de qalê dibe û  
hema çî

bigire tîmsala avahiyên giregir, şidet û zordestiya însên e. Ji wir me  
xwe

gîhand bajarê qedîm ê bav û kalên Apê Yaqûb Aşûrê ko beriya me  
bi

hezaran salan ava bûbû û navê xwe dabû Împaratoriya Aşûrê û  
nifşên ko

ji hezaran salan û vir ve dihatin bi çîrokên wî mezin bûbûn. Di wir re  
em

daketin Tekrîtê, bajarê Dîcleyê ko ehlê wî bi tamamî ereb bû û însan  
dikare bibêje ko hingê tixûbekî nediyar ê di navbera Mezopotamya  
Jorîn

û Mezopotamya Jêrîn de bû. Ji Tekrîtê em gihîştîn yek ji herêmên  
herî

geş ên welatê çemê Dîcleyê, bajarê Îslamiyetê Samarayê ko qûleya  
wî, mî-

na qûleya Babîlê, ji dûr ve dixuya û bi fermana kurê xalîfe Harûn  
Reşîd,

xalîfe El Mutasim bilah hatibû ava kirin û di demeke kurt de bûbû  
yek ji

navendên girîng ên medeniyetên cîhanê û piştî demekê, ji nişka ve,  
 têk  
 çûbû û hilweşiyabû. Ji wir jî me xwe berda bajarê navdar ê çemê  
 Dîcleyê  
 ko bi roj bi tîrêjen tavê, bi şev jî bi ronahiya qendîlan diçirûsî û bi  
 darên  
 xwe yên palmiye, serpêhatiyên xwe yên xelîfeyên îslamîyetê û  
 çîrokên  
 xwe yên Hezar û Şevkê nas bû, yanî Bexdayê.  
 Ji bilî Bexdayê, heke em bajarên biçûk ko li kêlekên wan ava bûbûn  
 nehesibînin, hema çî bigire hemû bajarên din ên kevnare bûbûn  
 kaviil û  
 kund li ser dîwarên wan ên wêran dixwendin û kulî li ser banê wan  
 ê  
 hilweşiyayî dipengizîn. Tarîxek ko riyên nû li ber însaniyetê vekiribû,  
 di  
 nav qûm, ax, toz û heriyên wan bajarên wêran û hilweşiyayî de  
 veşartî bû.  
 Ne bi tenê bajarên ko wextekî mîna stêran diçirûsîn, herweha  
 tarîxeke  
 kevnare û abadîn jî li wir ketibû xewa giran a mirin û jibîrbûyinê.  
 Dîcleyê  
 di nik Aşûrê re ko çirûskên dawîn ên heyatê tê de, ji mêj ve  
 temirîbûn, bi  
 xêzeke fetloke, çiv dida; birc û dîwarên keleha Samarayê yên  
 jihevketî,  
 mîna ko ew li hêviya çilkeke heyatê bin, stûxwar, li çola bêdawîn û  
 stewr  
 dinihêrîn; herçî Tekrît ko li ser girekî ava bûbû, li çem dinihêrî, li wir  
 jî,  
 mekanên herî jîndar, qahwexaneyên kêleka çem bûn, ko tê de,  
 mîna qah-

wexaneyên Mûsilê, bi tenê mêş û kelmêşên rabûbûn govendê,  
jîndar  
bûn.

Heyat li wan deran bi tenê Dîcle bû; av, herikîn û tevgera çêmbû ko  
maneyekê dida heyat û wextê, dewr û dewranê.

Tevî ko havîn û mehên herî dijwar li pey me mabûn, dinya hê jî di  
nav

çola bêdar û bêber de gelekî germ bû, ji lewre meşa kerwên gelekî  
giran

bû, li her qonaxekê, li her bajarekî em disekinîn. Bi tenê li kêleka  
çêmbû dar

û hêşinahî hebûn, lê li wan deran jî ordiyêke têkûz a pêşiyên  
xwînxwar ko

bi ordiyên kevn ên aşûr û medan dişibyan û ji tîna tavê û deviyên li  
ber

devê avê hez dikirin, bedena însên di nav kêliyêke de diqulipandin  
ser

seradeke qulqulî. Bêbavê pêşiyên welê êrîşêke bêrawest dibirin ser  
însên

û welê bi însên ve didan ko agirê derbên wan ji agirê tîrên keldanan  
jî

xirabtir bû. Lê ji ber bextê me yê çê, li rê em hema çî bigire hertim  
pêrgî

şivan û keriyên pêz ko bi hêviya misteke giya, bêserûber û gêjik,  
çerx

dibûn, gundên biçûk ên ereban ko xaniyên wan ên teng û tarî bi  
kerpîçên

şewitî lêbûbûn, filehên koçer ên ereb ko konên xwe yên reş ko pirî  
caran

bi mûyên bizinan hatibûn risandin, li ber avekê, bîrekê yan jî di bin  
siya

darine zirav de vedabûn û pêrgî refên cendermeyên osmanî ko  
hertim li

rê bûn û ji devereke Mezopotamyayê vediguhezîn devereke din,  
dihatin

û bi xêra wan, em ji hespan peya dibûn û me bîhna xwe bîstekê  
berdida.

149

Herçî çemê Dîcleyê bû, di navbera Musil û Bexdayê de, tijî keştî û  
kelekên biçûk ên gulover ko ereban jê re digotin gufa, bû.  
Rêwîtiyeke boş

di riya çêm re hem ber bi jor hem ber bi jêr li dar bû.

Di rêwingiya me de, dengên ko herî zêde me dibihîstin, heke em  
qîre-

qîra bazirganên kerwên, ewteewta segan, dengê tîz ê pêşiyên  
bêbavan,

hîrehîra hespan û gufegufa deveyan nehesibînin, hingê dengê  
dolabên

avê bû, ko di kêleka çêm re mîna dîwarên ko bi kemeran hatibûn  
birîn,

xwe dirêjî avê dikirin û ava çêm bi alîkariya cok û qetekan  
digîhandin ser

erdan û mîna cinawirekî her û her xurçexurç dikirin û zûrezûra  
wawîk û

kûzekûza çeqelên şevê bû, ko hertim êvaran li dora kerwên  
digeriyan û bi

dengê xwe deveyên kerwên, hespên me, bergîr û kerên bedewiyên  
ko li

rê, li cîhine diketin nav refê kerwên, eciz dikirin.

Li her bajarî kerwansarayine qehîm û kevnare ko tê de her celeb  
însan

ko bi her texlîd kar û şuxilî radibûn û bi her celeb zimanî dipeyvîn,  
hebûn. Hal û hewalê dinyayê, xeber û nûçeyên war û welatan,  
pisepisên

li pey derî û hewşan, bûyer û serpêhatiyên beg, mîr, şêx, paşa û  
padîşa-

han, biha û erzaniya kirîn û firotinê, kelam û stranên ereb, ecem,  
cihû,  
keldan û milletên din ên navçê û hema çî bigire her tiştê ko dihate  
bîra î-  
sên li mezelên teng, aşxaneyên genî, mevanxaneyên bi dûmana  
cixare,  
qelûn û nergilê tijî û eywanên hûnik ên wan kerwansarayan de  
dihatine  
peyvîn û gotin.  
Rojekê, li kerwansarayeke gelekî kevn ê welê ko ji mermerê verişî  
yê spî  
lêbûbû, li Samaraya xopan ko ji mêj ve aşên xwe betal kiribû, danê  
êvareke piçekî sayî, li eywana fireh û avkirî ya xanê, li ser sedirên  
dirêj ên  
bi cawên neqîşkirî dirûtî, rûye me ber bi tîrêjên hêlesor ên tavê, min  
û  
Migo, me, cangiran û sist pal dabû. Min, taseke kûr tijî xurme li ber  
min,  
xurme lib bi lib davêtin devê xwe û di navberê de jî, çaxa min ji  
xwarina  
xurmeyan keys didît, gotin li hev siwar dikirin. Migo jî bedentevizî,  
çavn-  
ermijî di xew re diçû. Dotira sibê, berî ko tîrêjên tavê li me hilbihata,  
me  
dê dîsan ber bi aliyê Bexdayê bida rê. Me bîhnvedan diviya. Min ji  
tecrubeyên xwe yên medrese û kitabxana Mam Sefo dizanîbû ko  
xelkên  
dûrbîn û zîrek hebûn ko bûyer, serpêhatî û ger û geştên xwe  
vediguhezandin ser kaxizan û ew dinivisîn. Lê herçî ez bûm, mîna  
wan  
kesan ne zîrekê pênûsê bûm, navbera min û nivisînê ne baş bû, ne  
pênûs

û defterên min hebûn, ne jî kitab û mewkîteyên min, ji lewre min jî tiştên

ko min didîtin û dibihîstin, bûyer û hîsên ko di dil û mêjîyê min de olanekê vedidan, bi alîkariya gotinan, diqulipandin ser stranan; stranên

150

ko bi tenê min ew li hev danîn, bi tenê min lê guhdarî dikirin û bi tenê

min pê dizanîbûn. Hingê, di eywana xana kerwanan de jî, ez her bi şix-

ulê xwe mijûl bûm, li milekî xurmeyên şêrîn, li milekî jî gotinên şêrîn li

nik min bûn. Lê Migoyê nefsek ko li ser sedira kêleka min, di xew re diçû,

heye ko ew li xurmeyan tamijê be, hişyar bû, destê xwe avête tasa xurmeyan û bi dengê ehebî gote min,

Kuro Biro, babilindo! Ma ez ê ji destê te herim kû? Law tu nahêlî ez bîskeke çavê xwe jî germ bikim! Ev çi qîreqîr û lorelora te ye?

Qîreqîra çi, lorelora çi? Min bi comerdî tasik dirêjî wî kir û gotê, ez bi

dengê nizm çêla ders û tecrubeyan dikim, wan li hev tînim.

Tu û ders û tecrube! Tu li kû, ders û tecrube li kû! Wî got û rahişte tasikê.

Ji bo ko însan bibe xwedî ders û tecrubeyan, divê însan wan li hev bîne,

ji ber bike da ko wan ji bîr neke, bavê dapîra mino, Migo.

Yanî tu niha van qîreqîr, pitepit û loreloran ders û tecrube dihesibînî?

Wî, dev tijî xurme, bi zehmetî got.

Ne qîreqîr, pitepit û lorelor, lê gotinên sakîn ên ders û tecrubeyan, got-

inên zeman û dewranê... gotinên heyatê... min bi awazekî nerm mîna

lorînekê gotê.

Migoyê qelew ko diviya min navê wî li wir biqulipanda ser Migoyê xurmexwaro, tafilê hemû xurme xwarin, bi awirekî tirş carekê-du caran li

min nihêrî, mîna ko heşê wî ji min tişteki nebire, çend caran serê xwe li

ba kir û bêyî ko bersîva min bide, milê xwe yê rastê xiste bin serê xwe, qû-

na xwe ya fireh ko bi qasî dolabeke avê mezin bû û jê bîhneke nexweş di-

hat, ber bi min kir û dîsan pal da.

Migo, xemxwiro, min hêdîka, mîna ko ez wi bilorînim, gotê, heyat, Migo, ji heyata ko em pê dizanin, kûrtir, firehtir û fetloketir e. Çaxa tu

dil bikî wê biqulupînî ser riyeke rasterast, ser kaxizeke spî, ser gotinên

basîd î hîç û pûç, tu dê şaşî bikî. Heyat ne bi tenê ev kevirên xirbe, ev

dendikên xurmeyan, ev ava Dîcleyê ko em dibînin in, lê ba û dengên ko

di nav van kevirên xirbe de digerin, reh û rêçên dara xurmê ko di kûrahiya axê de ne, pêl û tevgerên ko di binê ava Dîcleyê de têne pê û em

nabînin, evana hemû jî perçeyên heyatê ne. Çaxa tu perçeyekî bihesibînî

û yekî din nehesibînî, çaxa tu çavê min ê sax bibînî û yê ko bi derba şûr

kor bûye nebînî, hingê tu dê çewtî bikî. Heyat mîrasa bav û kalan e, hey-

at yadîgara tarîx û wextan e. Û ji bîr meke, hevalê min ê xurmexwar, hey-

at, belayê serê me ye jî... ev xanî û avahiyên xirbe, birc û kelehên



hilweşiyayî, qesr û qonaxên şewitî, ax û erdê kizirî ko hemû felaket  
û  
mûsîbet, jan û êşa însan û însaniyetê bi bîra me tînin, evana jî aîdê  
hey-  
atê ne. Jan û êş Migo, xizîn û keser... ev jî perçeyên heyatê ne, ev jî  
dibin  
ders û tecrube. Lê bi xêra gotin, stran û lorînê, Migo, hevalê min ê  
qûn-  
geniyo...  
Di êvareke, na ne êvar, di şeveke tarî û çikî sayî de, mîna komika  
keleşan ko hertim xwe dispartin reşahiya şevê, yan jî mîna  
heramiyên  
Bexdayê ko bi dizî diketin bajêr û jê derdiketin, kerwanê me jî welê  
kete  
Bexdayê, bajarê ko di xeweke kûr de bû. Dinya jixwe girtî bû û ji find  
û  
qendîlne qels ko li vir û li wir, di pencereyan re dixuyan, pê ve çu  
ronahî  
di bajarê ronî yê medeniyeta îslamiyetê de nîn bû. Bexda ko li milê  
ro-  
javayê çemê Dîcleyê ava bûbû û xanî û taxên wî li gora tevgerên ava  
Dîcleyê hatibûn pê, kirasê xewê li xwe kiribû û ketibû nav şevêk ji  
şevên  
Hezar û Şevêkê yên keça narîn, xweşik û bîrbir Şehrezadê ko bi  
qesta  
çîrokên şevan û quweta gotina edebî, hêrs û şîdeta hukimdarekî,  
şev li  
pey şevê, haş fikir. Lê belê serekên dewr û dewrandîtî yên kerwanê  
ko em  
pê re bûn, dizanîbûn ka em ê bi kû de biçûna û kerwanê me, bêyî  
ko zêde  
deng derxe, di nav kuçe û kolanên teng re bûrî û xwe gîhande ber

avahiyeke kevn û mezin ko jê re digotin Xana El Ortme. Xana El Ortma ko me dotira rojê, bi ronahiya çavan bedewî û xweşiyên wê dîtîn, ez dikarim bibêjim, tevî jûrên razanê, banê spehî, aşxana fireh, mêvanxana bi kursiyên nizm ko bi benê kendirê ristî raxistî bûn, dîwana bi sedir û doşegên neqîşandî lihevhatî, hewşa fireh a çarkoşe, eywana bilind û axurê bêser û ber, xana herî xweş, baş û kevn a hemû Mezopotamyayê bû.

Bexda bajarekî yekta yê Mezopotamyayê bû; bi avahiyên xwe yên spe- hî ko bi qermîten şewitî lêbûbûn, bazarên xwe yên ko tê de ji şîrê şêr bi- gire heta hêkên teyrê simîr, her tişt peyda dibû, xaniyên xwe yên basîd ko bi kerpîçê ava bûbûn; bi mizgeft û minareyên xwe yên ehlê misilmanên şafî, henifî û şîî, dêrên xwe yên filehan ên katolîk û ortadoks, hevriyên xwe yên cihûyên Mezopotamya Jêrîn û hemû navçeyê; bi taxên xwe yên misilmanan ko ji ereb, kurd, faris, tirk, çerkez, moxolî û afganiyan diha- tine pê û taxên cihû û filehan ko ji ermen, keldan (aşûr, nastûr, suryan, yaqûbî jî tê de) û firengiyên Ewrûpayê ko li Bexdayê bi karê tîcaretê mi- jûl bûn an jî bi karê dewletên xwe radibûn; bi hewş û eywanên xwe yên gelekî bedew ko bi yên Mûsil, Diyarbekir û Cizîrê dişibiyan, qonaxên

xwe yê hukimeta osmanî ko li kêleka çem cîhen herî bedew  
vegirtibûn,

şaneşînên xwe yê fireh û xweşik ên xaniyên giregirên Bexda, sefir  
û kar-

152

bidestên dewletên Ewrûpî û yê kumandar û paşayên osmanî ko li  
qi-

raxên çem bûn û jê bergeheke rengîn, nemaze danê êvaran, berî ko  
tav

here ava, dixuya, bêpayan bû. Li Bexdayê ko di dema xalîfeyê ebasî  
Harûn el Reşid de gihîştibû bilindahiyên dewlemendî û medeniyetê,  
her

kes, her dîn, her ziman, her qewl, her derew, her lîstik, her bêbavî,  
her tişt

hebû; dengê zimanên samî, arî, moxol û reşikan li bin guhê hev  
diket, cil

û bergên xelkên cihê, bi hev re deryayeke rengan dianîn pê.

Jinên Bexdayê yê ji hemû miletan di nav çarşefên xwe yê reş û  
dirêj

de, bi nêrîna çavên nazdar ên kilkirî, li kolanên teng û şaneşînên  
fireh, li

keştî û qayikên bajêr, li mal û cîhên edebê, bi nazenîn û bi cîlwe  
arzûya

bedena nerm derdixistin qata heftan a asimanan. Bi xêra Mam Sefo  
ko

hema çî bigire me ji bîr kiribû, şûr simbêlên me nedibirî, mecîdiyên  
me

yê giranbiha, zêrên me yê zer hebûn, zikê me têr, cil û bergên me  
nû,

bêrîkên me tijî bûn. Em li xana El Ortmê diman, me arzûya xwe ya  
xort

û har a bedenên nermik li mal û warên germ û musîkşînas, li nik

hurmeyên porzer, porreş, çavşîn, çavbelek, zimanşêrîn û dengxweş  
ko bi  
ziman û awazên têkel stran digotin, hema çî bigire bêrawest, aş  
dikir û  
danê êvaran jî me qayikeke biçûk kirê dikir û li seranserê çêm, geh  
ber bi  
jor, geh ber bi jêr, li ser zimanê min gotin û stranên Cizîra Botan û  
êzidiyan, li ser zimanê Migo jî rêz û kalamên Tewrat û Încîlê, em  
derdiketin seyranê û ji çêm me bajar, gav bi gav, xanî bi xanî careke  
din  
dinasî.  
Zivistana wê salê baş derbas bû, ne baraneke boş hat ne jî lehiyên  
ko  
diqulipîn ser felaketekê û bajar di bin avê de dihîştin, rabûbûn.  
Sûtal,  
tiral û pêxwasên Bexdayê ko mîna parsekên bajêr bêhejmar bûn, di  
wex-  
tê zivistanê de jî, bi qîreqîr xwe ji lengergehên xaniyên kêlekên çêm  
noqî  
avê dikirin û bi soberî ji milekî diçûn milê din. Aramiya dinyayê ji bo  
me  
jî fersend bû da ko em di riya xwe de biçûna.  
Serê sibeyeke sayî û zelal, me hespên xwe yên esîl, têr û nûtimarkirî  
ji  
tawleyên xana qedîm a mêvanperwer derxistin, xurc û boxçikên  
xwe  
avêtin pişta hespan û ber bi Babîlê da rê. Du riyên çûyina Babîlê  
hebûn;  
ya yekê, însan dikarîbî bi siwarî, rasterast ji Bexdayê biçûya Babîlê  
ko ji  
Bexdayê ne zêde dûr bû; riya diduyan jî, însan dikarîbû peya yan  
siwar, ji

Bexdayê biçûya bajarê Nasrahiyê ko li kêleka çemê Firatê bû û ji wir  
jî bi  
keştî daketa Babîlê. Me dil hebû xweha nazenîn a Dîcleyê Firat jî  
bidîta  
û rêwîtiyek, ne bi keştî, lê bi hespan, di kêleka wê re bianiya pê.  
Loma jî  
em pêşî çûn Nasrahiyê û me xwe gîhande çemê Firatê ko mîna çemê  
153  
Dîcleyê heyateke şên, geş û biber dibexşand navçeya stewr. Li wir,  
li ber  
devê Firatê jî em careke din têgihîştin ko kahniya hemû heyata  
Mezopotamyayê, reh û rêçên hemû medeniyet, ehl û qewmên ko  
hati-  
bûn û çûbûn, ev herdu çem bûn. Bêyî Firat û Dîcleyê dê ne  
medeniyetekê bihata pê, ne jî mîraseke birûmet a însan û  
însaniyetê.  
Bêyî ko em bilezînin, gav bi gav, qonax bi qonax, geh taştêyeke bi  
şîr û  
nanê hişk ê sêlê li ber konê bedewiyên koçer, geh firavîneke bi  
savar, sîr-  
mast, humis û acûrên dagirtî, li mêvanxana gundekî kevnare yê ji  
wextên  
keldanan mayî, geh şîveke bi tîkegoştên xezalan tijî, li aşxana  
xaneke  
gemarî, di kêleka çemê Firatê re ko herdu milên wê tijî bax, bexçe,  
darên  
palmiye, xurme, qamîş û hêşinahî bûn, me nezîkî li welatê Babîlê kir  
û  
danê êvarekê ko asiman tijî ewrên spî û teyrên qulingan bûn, em  
gihîştin  
warê kahniya medeniyetên rojhilatê. Gava çavê min bi gir û  
bilindahiyên

Babîlê ketin, dilê min pihêt hilavêt, mîna ko dewr û dewranek ko berî zi-  
yareta me bi pênc-şêş hezar salan hatibû pê, ji nû ve vejyabe û ew dewr û  
dewrana bihurî ji nû ve rabe govendeke ronî û şewqtijî, welê ji ber heye-  
cana min ko min hew dizanîbû ka kefxweşî bû yan xemgînî bû, nefesa  
min çikiya. Hersê girên esasî yên Babîlê, girê Babîl, Qesir û Emranê, li  
wir, li ber me, mîna ko ew bang li me bikin, dixuyan. Me ji wan çîrok û  
meseleyên ko me xwendibû û bihîstibû, dizanîbû ko qesra qralê nemir ê  
Babîlê Nebûkadnezar ji wan giran bi qasî bîhnekê bi dûr bû; Qûleya Babîlê ko di Tewratê de çêl lê dibû û bûbû sebaba jihevketina qewm û zi-  
manên însanan, li kêleka Firatê, nêzîkî girê Emranê bû; deriyên Xwedawenda babîliyan Îştare ko bi bircên bilind ên kelehekê dişibiyên û  
bi neqîş û sûretên kolayî tijî bûn û di wextê xwe de tîmsala xurtî, dewle-  
mendî û mezinahiyê bûn, li wir di nav xwelî, toz, ax, gêç û xîçikan de bû.  
Şêr û pilingên ko bi qasî zinarekî çiyayên Zagrosê mezin bûn û bi kevirên  
nehîrê bazal lêbûbûn û conega û firîşteyên ko di dîwarên qesr û qonax-  
an de hatibûn kolandin di navbera wan gir û bilindahiyên de bûn. Tarîxeke keserkûr, serpêhatiyên xwînxwar, qederen însanî yên tijî jan û  
xizîn, şer, êrîş û pevçûnên xedar, xwestek û mirazên zahf bilind, evîn û

sewdayên kûr, hêrs, kîn û nefreteke bêpayan, rik û înadeke mîna  
pola,  
şûr, rim, tîr û xencerên xwînê yên tûj û jahrîn... ev hemû di nav wan  
gir û  
di bin wan qûm, xîç, qermît, kerpîç û keviran de veşartî bûn.  
Migo jî, heke ne zêdeyî min bûya, bi qasî min, bi heyecan bû, li ser  
hes-  
pê xwe yê kumêt, hûrê wî daketî, gewdê xwe yê mezin dihejand, bi  
dîqet  
li kavlên Babîla şewitî dinihêrî û rêzên Tewratê ko çêla Babîle  
dikirin,  
154  
mîna dînekî çolê ko ji nav xwelî û xîçikên Babîlê vejîyayî be, diqîriya;  
Û ziman û gotina hemû cîhanê yek bû... û însanan got, em li cîhanê  
belav nebin, werin em ji xwe re bajarekî û qûleyekê ko serê wê  
digihîje  
asimanan ava bikin û ji bo xwe nav û şoretê li dar xînin... û Rebê  
Alemîn  
peya bû da ko bajar û qûleya ko benî ademan ava dikirin, bibîne û  
Reb  
got; hemû qewmekî ne û zimanê wan hemûyan yek e... lê werin,  
em peya  
bin û zimanê wan li wir tevîhev bikin da ko ew ji hevûdu fêhmekin.  
Û  
Rebê alemîn ew ji wir li seranserê cîhanê belav kirin û wan êdî dev  
ji  
avakirina bajêr berda; ji ber vê yekê navê bajêr bû Babîl...  
Û Migo diqîriya; ba... ba... ba...  
Heke mesele were ser tiredîniyê, bêguman, ez jî ne kêmkî Migo bûm  
û  
lingên min pihêt li ser zengûyan, hevsar di destê min de, li ser hesp  
ez

rabûm ser piyan û min serê hespê xwe yê qemer ber bi qiraxên  
çemê  
Firatê berda û ji Migo jî bêtir dest bi qîrînê kir;  
Govend e, lo govend e... govenda ronahiyê ya Babîla kambax e...  
Stran  
e, lê stran e... strana welatê şêran e...  
Bi qasî çend hefteyan, em li Babîl, gundên der û dorê û li kêleka  
çêr,  
ber bi milê jêr, heta cîhê ko Firat û Dîcleyê, ev herdu cewiyên  
comerd û  
delal ên Mezopotamyayê, piştî hesreteke bêpayan a welat, dewlet,  
war û  
navçeyan, xwe digihandin hev geriyan û bi dû re jî, çaxa em  
têgihîştin ko  
dilê me êdî rehet e û deng û pejnên war û welatên ko me dîtine,  
dewr û  
dewranên ko me di dil û ruhê xwe de bihîstine, êdî di xewnên me  
de olan  
didin, hingê me gotina bav û kalan ko dibêje, kesê ne li ber çav e,  
ne li ber  
dil e, bi bîr anî û serê hespên xwe ber bi jor, ber war û welatê bav û  
kalan  
ko em jê dihatin, bada.  
Lê roja dawîn, berî ko em, tevî çar-pênc alemanên navsere û alîm  
ko  
ketibûn pey çîrokên Tewratê û hatibûn Babîlê û bi zimanê fransizî  
ko  
Migo pê dizanîbû, hemû kitekitên Babîlê, bi nîşandana cîh û waran,  
ji  
me re gotibûn, herin gundê nêzîk û xwarina êvarê bixwin, li ser girê  
Babîlê, çavê me li dîwar, qûç û avahiyên xirbe, Migo, destekî wî li  
ser rîha  
wî, ji min pirsî,



Biro, aqilkêmo, aqilê te ji vê seyhata me ko ne şixulê aqilan bû, çi birî?

Min tavilê bersîv nedayê, qermîtekî sor ê şewitî yê xirbeyan di destê min de, min li tîrêjên ko di nav toz û gemara gir û avahiyan re li piştê dîwarên hilweşiyayî dixistin, dinihêrî. Li hinekî dûrî me jî ava çêmbî tîrêjên tava zivistanê diçirûsî û zilikên li ber devê avê bi bayekî sivik diliviyên û pelên zilikên xwe li ava çirûsî dixistin. Çend teyrên başoke yên

155

tiral, bi qîjeqîj di ser avê re û li ser serê me difiriyan, marîjok di nav kevi-

ran re çiv didan û kuliyan ko bi qasî tiliyekê mezin bûn, ji kevirê ko bi

tîna tavê û toza hezaran salan qulipîbû ser rengê boz, dipekiyan ser ke-

virekî din. Ro diçû ava û dinya aram bû, mîna ko ew felaketên însanî ko

car bi car qewimîbûn, li van deran nehatibin pê. Mîna ko ew bi tenê çîrok

bûn, ne dengê, ne jî pêjnek, mîna ko her tişt, bi temamî her tişt li pey

mabe, hawîrdor ewçend sakîn, zelal û bedew bû.

Migo, Xwedê ji te, ji bavê te û heft bav û bavikên te razî be, min piştî kêliyê gotê. Bav û kalên me gotine, bipirse û netirse. Me jî pirs kir û

bêtirs em ketin riyan û heta van deran hatin. Heke em nehatina, niha me

dê ji kû bizanibûya ka rengê vî qermîte destê min çî ye, çima ev teyrên

başoke ko ez bawer im, ji hezar salan û vir ve her û her li asimanên welatê

Babilê ne û kuliyan reş ko di Tewratê de qala wan dibe, perçeyên heyata

Babîlê ne.

Biro, dev ji van gotinan berde, Migo qermîtê destê min wergirt û li min

vegerand, tu dîsan bi mebesta hin tiştan van gotinên şaşo-maşo dibêjî...

Bibêje ka tu çi dibêjî.

Mebesta min, deng in, bavê mino, deng... dengê qermîtê, dengê başoke û kuliyan, mar û marîjokan, toz û xweliyan, kaviil û xirbeyan...

deng û zimanên Qûleya Babîlê, girên bêhejmar ên welatê aşûran, dengê

saz û zilîkên li ber devê ava Fîratê, dengê şêr û pilingên keldanan... dengê

şûr û mirtalên li ser bircên bajarê Babîlê, dengê şewat û hilweşîna qesr û

qonaxên bajêr... Xwedê ji te razî be, Migo, te ez gîhandim van dangan...

Em ji vê gera xwe çi hîn bûn? Em ê çi hîn bibin? Hê jê re wext divê Migo,

hê zû ye... ew ê mîna tovê di dil û ruhê me de bikemilin, hêşîn werin, zîl

bidin û paşê em ê bibêjin ka ev deng çi ne, yê kê ne, çi dibêjin û çêla çi

dikin... Helbet mîna ders û tecrubeyan... û heye ko mîna gotinên stranekê...

Dengê strana Dîcleyê bêguman bêyî dengê çemê Fîratê, cêwiya Dîcleyê,

nayê bihîstin. Herdu çem, herdu deng hevûdu temam dikin û jê dengêkî

tînin pê; dengê qedera Mezopotamyayê.

Mezopotamya me ez

Rehên min av û çem

Heyata min pevçûn, mijarên min xwîn

Lê zimanê min bedewî, gotina min ebedî

156

Hertim, ji gotina her şaîr û waqanûserî bêtir

Wextek li ser lêvên Gilgameş, li qiraxên çemê qedîm

Di heşê Nemrûd

Di ruhê Yûnis

Di dilê Brahîm de, li welatê tofanê

Vekin rûpelên kitabên miqedes

Vekin deriyên ruh û dilê xelkê

Li wan deran im ez

Olana min li wir

Guh bidin min

Guh bidin axa min a bi tav û felaketê şewitî

Tov, zayîn, geşî, xweşî, arzû, evîn, hemû ez

Agir, şewat, hilweşîn, kirêtî, nefret, dijminahî hemû ez

Hemû di reh û rêçen min de, hemû di kûrahiyên axa şewitî de

Her tişt bi min dest pê dike, bi min vedimire

Roj hebû, hesreta min dilopeke baran

Rojeke hûnik, dengê gur, awazeke zelal

Simbilên şox ên genim, ce, garis

Hesreta min dilopeke av li ser pelên darên tû

Darên palmiye, darên xurme bê ba, bê deng

Giya naçirûsin di nav kavilan de

Quling naxwînin, legleg bê hêlîn

Şev reş, roj cûn

Guh bidin qîrîna axa şewitî

Qîrîn, şewat mîna şûrê mirinê li ser sînga min daçiqî

Hemû rim, misas, şûr, xencer û tîr jengîn

Hemû di dilê min de

Û ez bêdeng, bêtirbe, bêkêl

Ka bexçeyên Semîramîs, baxên Sanherîb

Qesrên Sargon, kolanên Sardanapal, bircên Nabopolasar

Ka havîngehên Nabûkadnezar

Ka çem û bendên Îskender  
Guh bidin axîna Firatê, hawara Dîcleyê  
Ez, axîn im ez, hawar, hawar  
157

Deng im ez, ji dewr û dewranan  
Olan im ez, ji kaviil û xirbeyan  
Hêrsa axê, tola xwînê  
Hukmê wextê, fermana heyamê  
Navên do û îro me ez  
Li welatê çiyar  
Li welatê çolê û li welatê çeman  
Bi kilama dengbêjan her û her dijî...

158

### ŞEVBUHÊRK ÇAR

ax

Dengê min, yanî dengê Biroyê birîndar, xwediyê kevirê teyrê tawis  
û mê-

vanê kaviilên Nînova, Aşûr û Babîlê, îşev jî, dîsan bi we re ye.

Êvareke nû, şeveke nû, şevbuhêrkeke nû.

Şevbuhêrka çendan? Ji şevbuhêrka me ya dawîn û vir ve çend şev  
bi-

hurîn? Çend roj hatin û çûn? Çend darên bihîfan kulîlkên xwe yê  
ge-

wher bişkovandin, çend darên hinaran bi kulîlkên xwe yê çik î sor  
xwe

xemilandin? Dilê çend bêrîvanan bi çilka evînê hate hingavtin? Çend  
ci-

wanmêran ji bo çavên kilkirî, porê gulîkirî û bejna rihan stran û dîlan  
li

hev anîn? De bêjin min, xortên çeleng, bêjin min ka ji şeva me ya  
dawîn

û vir ve dil ji bo çî hildavêtine, ruh çî bihîstine, mêjî bîr bi çî birine...

Hûn

çi dikin, çi dijîn, çi dibêjin? Serê Cizîra Botan a xopan îro li ser çi  
 balîfê  
 ye? Xortên îro, de bêjin vî kalemêrê do ko êdî li ser riya çûyinê ye û  
 gaveke  
 din nêzîkî li xewa ebedî kiriye, ka îro çi ye, çawan e... Evîna îro çi ye,  
 çawan e?  
 Dîsan êvar e, dîsan dinyaya westiyayî xwe xilmaş dike, dîsan ew ê  
 bikeve xeweke kûr da ko dîsan di sibeheke zû ya ronî de, zînde û  
 vejîyayî  
 hişyar be. Hûn, guhdarên dengê min ko çêla wextekî çûyî dike, hûn,  
 xortên heyama nû, niha, çaxa hawîrdor, her tişt xwe dispêre xewê,  
 dîsan  
 guh bidin dangan; guh bidin axîna bayê çiyayê Cûdiyê, dengê bilûra  
 şî-  
 vanên ko pezên xwe ji bo hevşiyê hingûran mexel kirine, dengê  
 deng-  
 bêjên ko gotinên evîna germ û xort ko li qiraxên çemê Dîcleyê û li  
 ser  
 zozanên çiyayên Zagrosê tene pê, li hev tînin.  
 Çaxa dinya dikeve xew, çirûsk li asimanan vêdikevin, stêr bi sûzenî  
 dix-  
 emilin û aramiyeke kûr ava çem vedigire, hingê hûn hişyar bin,  
 xortên  
 qedirgir, hişyar bin û li dangan, li kitekitên dangan guhdarî bikin; di  
 nav  
 axîna bayê êvarê de îlahî, lavij û duayên tarîxeke kevnar a xwîntijî  
 hene;  
 di nav dengê bilûra şivanan de nefesa serpêhatiyên do yên kesertijî  
 hene;  
 di nav gotina dengbêjên îro de, bihîstiyariyên evînên do yên  
 windabûyî  
 hene.

Êvar tê, şev tê, şevbuhêrk tê. Ho xortên bîrbir, deriyên dilê xwe yên  
êvarê vekin, her celeb sistî, sûzenî û endîşeyê bidin alî û xwe bi  
dengan re  
bikin yek, bibin hevalbendên dengan, – dengên ko ji hevrêşim  
nermtir,  
ji şûr tûjtir, ji şîr şêrîntir, ji avê zelaltir, ji agir germtir in. Yanî dengê  
ba,  
bilûr, dengbêj, evîn û serpêhatiyên însanî.  
Yanî dengê min ko hema çî bigire, însan dikare bibêje, yekîtiya  
hemû  
van dengan e.  
Yanî dengê ko di roj û heyamên borî de hertim li pey xweserî û  
azadiyê  
bû. Azadî; gotineke gelekî dijwar û tijî tehlûke, gotineke nenas û  
xerîb.  
Ma ji bilî kesên mîna min û we, mîna Mam Sefo û Apê Xelef, mîna  
ew  
hemû kesên bêgav ên jibîrbûyî, kî ji gotina azadiyê hez dike?  
Nemaze di  
Mezopotamya xwînêj û kambax a jêrîn û jorîn de, – ko qulipiye ser  
gorekê ko azadî tê de binax bûye, li ber dilê kê azadî û gotina  
azadiyê ezîz  
e? We jî bêguman hay jê heye; gotina azadiyê hesteke xurt li nik  
hew-  
cedarên azadiyê ko lê xeyal dikin û xofeke kûr li nik têkbirên azadiyê  
ko  
pê qirfên xwe dikin, tîne pê. Azadî, ji bîr mekin, hertim azadî, li  
hember  
herikîna wextê, kesp û kospên heyamê, zor û zulma çerxa felekê,  
tevî her  
tiştî azadî; azadî, hûn bi tena serê xwe jî bimînin, di dawiyê de mirin  
û

kuştin jî hebe, dîsan azadî. Azadî, çûyin û dîtin e; keşfîkirin û nûkirin e.

Gava hesteke xurt kete dilê we, arzûyeke bêpayan ruhê we vegirt û we

xwe li tixûbên diyar û nediyar qeliband û mîna ko ew hîç nîn in, we ew

gav kirin, hingê hûn gaveke din nêzîkî azadiyê ne. Hingê hûn ê pê bih-

esin ko bayê nerm ê azadiyê por, rû û bedena we difirkîne û dengê strana

azadiyê, ne mîna marşeke eskerî ya osmanî û farisan ne jî mîna qîrîneke

beredayî ya berdevkên axa û şêxên kurdan, lê mîna lorîneke pîrejinan, li

ber guhê we dinihêje.

Mebesta min bi gotina azadiye ev e; ez û Migo ko ne bi tenê hezkar, lê

tiredînên azadiyê bûn, me tixûb dabûn bin lingên xwe, ew gav kiribûn û

gaveke din nêzîkî li azadiyê kiribû, bi dû re jî, dîsan di ser tixûban re, em

vegeriyabûn welatê bav û kalan, ko çend sal bi dû hatina me re daxwaza

azadiyê tê de bû bingor, belê em vegeriya bûn wî mekanê qedîm ko em

niha jî lê ne û tû û mewîjê wî dixwin, ava wî vedixwin.

Niha, îşev, hûn ê li vegera me, bûyerên piştî gera azadiyê guhdarî bikin.

Niha dîsan wextê gotinê ye; herwekî ko tîrêjên ronî yên spêdê zikê ava

tarî ya çemê Dîcleyê diqelişîne û dirêjî kûrahiyên avê dike û avê diqulipîne ser kahniya ronahiyê, gotina vê şevbuhêrkê jî dê welê tariya

şevê, bi dengên serpêhatiyan, biqulipîne kahniya dengên qederên  
însanî.

160

Gotin ê hawîrdor vegire, kelam ê hukim li wextê bike, heyat ê vejê  
û do

dê li îro zêde be. Eve, arzûya min e. Yanî gotin, bi tenê gotin, gotina  
ser-

pêhatiyan, qederan, hîsan, dangan... Xwîn germ dibe, reh diguvişin,  
mêjî

dide pey wextên bihurî û dil li dengên windabûyî digere.

Û şevbuhêrk dibin ders, dibin tecrube, dibin guharê guhê we.

Dengên windabûyî yên do, pêr; yên salên bihurî, yên sedsalên çûyî.

Hemû di mêjî û dil de li nik hev, li hev siwarbûyî. Dengê ji heyama  
me

ya nû, berî niha bi salek-du salan, dengê din ji zaroktiya min, yekî  
din

ji dewrên berî niha bi çend sed salan, yekî din ji Babîl û Nînovayê,  
yek jî

ji dema Nebî Nûh û Cûdiyê. Yek tê dinyê, yek dimire, yek di şahiyê  
de

ye, yek di şînê de, li milekî keser û jan, li milekî şadî û kêfxweşî,  
rojê kêf

û henek, dotira rojê axîn û nalîn. Û dîsan û careke din... Di bîr û heş  
de

hemû bi hev re, hemû dengên do jî, yên îro jî li nik hev, lê belê çaxa  
ew

tên ser zimên, divê ew ji hevûdu veqetin, li gora rêzeke têkûz,  
pergaleke

diyar bêne gotin, yek bi yek, kite bi kite li hev werin, mîna rengên  
neqaşekî bi hev re neqşekê bînin pê. Bîr û heş divê carina bi leza  
birûskê

here dewr û dewranên herî kevn, carina jî bi gavên giran ên kûsiyekî  
di



kolanên teng ên Cizîrê re, ber bi Cûdiyê derkeve seyranekê, carina  
tevî  
stranekê hilkişe gopikên çiyayên doralî, carina bi nefeseke dirêj  
noqî binî  
ava çemê Dîcleyê bibe. Xwediyê bîr û heş, yanî dengbêj, yanî guhdar  
di-  
vê hem di nav dewr û dewranan de bin, hem jî li derveyê wan bin,  
hem bi  
Cûdiyê re bin, hem jî bibin Cûdî, hem bi Dîcleyê re bin, hem jî bibin  
dengê strana Dîcleyê, hem bi tarîxê re bin, hem jî bibin tarîx.  
Bîr û heş, lê ne bi tenê bîr û heş, herweha dil û ruh jî divê bi gotinê  
baw-  
er be; bi ava çemê Dîcleyê, bi kevirê çiyayê Cûdiyê, bi pelê dara  
tûyê, bi  
tîrêjên tava Nînovayê, bi dilopa barana biharê, bi rondika çavê pîre-  
jinekê, bi dilopa xwîdana cotkarekî û bi dengê misoger ê tarîxê  
bawer be.  
Dengbêj divê bi axîna birîndarekî bawer be.  
Çîrokbêj divê bi nêrîna şikestî ya bêgavekî bawer be.  
Guhdar divê bi gotina edebî ya hûnandî bawer be.  
Wext ê winda bibe, mîna vê qendîla ko li dîwêr ronahî direşîne ser  
odê,  
hêdî hêdî, vemire. Lê dengên têvel ên wextan, ji zozan û çiyar, ji  
dahl û  
daristanan, ji gund û bajaran, ji çem û giravan, ê werin û odeya me  
ya  
neçar tijî bikin. Her tişt ê winda bibe û here, bi tenê deng ê bimînin,  
ez ê  
bimînim û hûn, dil û ruhê heyamên nû dê bimînin. Ez ê bang li  
dengan  
bikim û ew ê ji tariya şevê, yek bi yek werin şevbuhêrka me ko wext,  
dewr

û dewran li pey xwe hiştiye. Şixulê min ko min dil heye, sibêro bibe  
şix-

161

ulê we, bi tenê eve ye; bang li dangan kirin, wan li hev anîn û wan  
bi rêk

û pêkî veguheztin. Bi tenê eve... ji bilî vê yekê ez bi kêrî çu tiştî  
nehatim

û nema têm jî.

Berî niha bi kêliyêkê, berî ko hûn werin, piştî ko birînên min derman  
bûn, min xwe da hev, kevîrê xwe yê ezîz ê teyrê tawis xiste stûyê  
xwe, min

rahişt herdu gopalan û derketim der, ber derî. Min dil hebû ko ez  
heta

ber devê çem biçûma, lê min nikarîbû. Ji lewre ez li ber derî, ji  
taqetê ketî,

hûnikahiya bayekî sivik li ser rûye min, li piyan sekinîm û min li  
hawîr-

dor nihêrî. Ji axê bîhna biharê, tebiyeta nûvejiyayî dihat,  
hêşinahiyeke

boş dinya vegirtibû, dar xemilîbûn, pelên darên bêhejmar ên tûyê  
ko min

ewçend hez dikirin, mîna bûkeke xama û bedew xwe dilivandin,  
nêrgiz û

sosinan serî hildabûn, lalezarên rengîn ji qiraxên çem dirêjî lingên  
çiyân

dikirin, binevşên sor di sînga axê de golên sor anîbûn pê. Ava  
Dîcleyê ya

gur bi xuşînî, bi leylandên tîrêjên tava helesor çirûsî, diherikî. Cizîr,  
bajarê

kevnare yê çemê Dîcleyê, bajarê ko bûye qedera me, li milê jor, bi  
qasî

qonaxek, du qonaxan ji min bi dûr, mîna her carê ko ji pênc hezar  
salan

û vir ve hertim dubare dibû, bi dengên rojane, rojeke din a heyata  
ebedî  
bi dawî danî. Keleha bajêr, qesra Mîr, Birca Belek, bax û bexçeyên  
Mîr li  
kêleka çêm ko li wir çiv dida, mîna zarokê stûxwar ko bav û diya  
xwe  
winda kiriye, dixuyan. Li pey wan pira Dîcleyê ko herdu qiraxên çêm  
bi  
kemberên fireh û mezin digîhandin hev, mîna kevanekî vekîşiyayî  
yê  
wextên aşûr û medan dixuya. Ji bilî çend ewrên spî ko li dûr, li  
doralîyên  
çiyên mîna pîneyekê rawestiyabûn, li asiman çu tevger nîn bû.  
Asiman  
ko bi rengê tava ko êdî diçû ava, qulipîbû ser mehfûreke sor a  
welatê  
Kirmanşahê, mîna ko wê jî hay ji şevbuhêrka me hebe, haziriya  
êvarê  
dikir. Ji doralî deng dihatin, tevî ko min nikarîbû ew ji hev bianîna  
der,  
dengên têkel ên bajarê ko dest bi êvareke nû dikir, digihîştin min. Ji  
ba-  
jêr, ji kêleka çêm, ji dahlên li ber qûntarên çiyên.  
Deng, bîr û heş, Dîcle, Cizîr, salên ko li Cizîrê bihurîn... Ê niha. Piştî  
umrekî peregende û şerpeze, heyateke derketî li vî welatî, li wî  
welatî,  
dîsan veger, dîsan bajarê lîstikên zarokiyê, evînên destpêkê,  
gotinên  
xeşîm ên xortaniyê... Çemê min ê wan rojan, bajarê min ê wan  
salan... Li  
ber derî, nefesçikiyayî, xemgîr, birîndar û westiyayî, min dil kir ko ez  
jî,

mîna wan teyrên ko di ser serê min re, ber bi zozanan difiriyan,  
bifirim û

herim wan rojan, wan salan. Danê êvara îro ko yek ji danê êvarên  
min ên

bihejmar ên vê heyata kambax in, heta heye ko danê êvara dawîn  
be, ji bo

min çi îfade dike? Hema çi bigire çu tiştî; ez ne beg û paşa me ko  
hesabên

162

rojên bê bikim û ne jî xwedî mal, milk û zarok im ko mîratekê  
bihêlim

salên bê. Însanekî çavekî wî bi derba şûrê xwînêjan kor, bêkes,  
tenê,

sêwî, mirazqurmiçî, diranketî, rîberdayî, piştxûz û di ser de jî bi  
destê

hevalekî xwe birîndar, birîndarekî li ber mirinê. Eve, ez im; eve,  
kurte-

biriya umrê min e.

Ez; heyatek ko ne îro, lê di do de maye, umrek ko ne îro, lê ji do ve  
xe-

las bûye.

Niha, em vegerin ser heyata do, guhdarên bisebir ên îro, êvar tê û  
em

dakevin kêrahîyên do û dengên xwe yên ezîz hişyar bikin, êvara tijî  
xem

û xeyal bi qendîla gotinê ronî bikin, ronahiya qendîla gotinê bi  
ronahiya

stêran ve bikin yek, perda tarî ya şevê ji xwe, ji gotina xwe, ji  
hawîrdor bi

dûr xînin, xêrhatinî li geş û heyecana biharê bikin, sar û seqema  
zivistanê

ko ez ê careke din nema bibînim û bijîm, bi germahiya gotinê, bi  
temamî

têk bibin, xwe bigihînin bedenên nazik ko li hêviya hembêz, dest û  
tiliyên dilsoz û hurmetkar bûn, hinarikên nûbişkovî ko li hêviya  
ramûsaneke germ bûn, çavên evîndar ko li hêviya germahiya evînê  
û çil-  
ka merhametê bûn û xwe bigihînin nik wan însanên ko bêgav û  
bêçare  
mabûn. Em taceke narîn ko ji kulîlkên spi yên behîvan hatiye pê,  
deynin  
ser serê delaliyên xwe yên narîn, desteyeke gulên mihemedî deynin  
ber  
kêlên gorên însanên ketî û straneke geh geş, geh zîz bavêjin ser  
Dîcleya  
xopan ko hertim şahidî li her tiştî, her bûyerê dike.  
Gelî xortan, zû kin, tasa min a zîvîn a avê tijî av û kodika min a darî  
a  
mewîjê tijî mewîj bikin û deynin kêleka min, çend cixare ji titûna  
Xursê  
bipêçin û tevî xwelîdankekê deynin ber min. Teyfikeke hejîrên hişk  
ên  
çiyayê Şingalê jî ji bîr mekin, herwekî bav û kalan gotiye, hejîrên  
Çiyayê  
Şingalê bênavik in, xurmeyên Bexdayê bêdendik in... Xurmeyên  
Bexdayê ko min û Migo xwarin û min di şevbuhêrka çûyî de qalê  
kirin,  
hejîrên Şingalê ko min di zaroktiya xwe de dixwarin, anîn bîra min.  
Ez  
dixwazim îşev bibim zarok, kalê birînxedar ko hertim zarok bû,  
dîsan  
dixwaze li zaroktiya xwe vegere û îşev hejîrên wextên xwe yên  
zaroktiyê jî  
dixwaze...  
De zûkin, ez pê dihesim, ko axa reş a abadîn ko hertim li pey herkesî,

her celeb xebat û lebatê, her texlîd qîreqîr û xirecirê, dimîne, hertim  
bi  
mêvanperweriyeke bêpayan hembêza xwe ji herkesî re vedike, axa  
pîroz  
ko ez jê hatime û hertim qalê dikim, hembêza xwe ya pîroz û aram  
îcar ji  
bo min vekiriye û bangî min dike.

163

Dengê bajarê Cîzîrê, dengê Armê û Gulîzerê, dengê Mam Sefo di  
veg-  
era me de, êdî ne mîna berê bi aheng û bi olan bû, ji bervajiyê deng  
zîz,  
sext û sûzen bûn, heta însan dikare bibêje ko deng ketibûn nav  
kûrahiya  
bêdengiyê.

Mîna niha tê bîra min, gava em gihîştin Cîzîrê, êdî payîz bû û rojeke  
aram, zelal û bedew a payîzê diçû ava. Mîna îro, roja vegera me jî  
ava

Dîcleyê dibiriqî û hîsên geş ên aramî û kêfxweşiyê dida însên. Herçî  
asi-  
man bû, bi zelalî û spehîtiya xwe, mîna topeke nûrê, tîrêjên xwe yên  
ronî

dişandin. Li dûr, li ber qûntarên çiyar, gir, dar û dahl di nav mijekê  
de

bûn, lê belê mij mîna tûlekî tenik ê hevrêşimî dixuya, tûlekî nazik ko  
keçên xama yên hez û evînê xwe pê dipêçin. Mijê bi regekî boz ê  
qurşûnî perde perde, geh ber bi jor, geh ber bi jêr, dar û dahl, kevir  
û zi-  
nar dipêçan.

Li ser wan hespên me yên wefakar ko me li Mûsilê ji wan dostên  
we-

fakar ên keldanan deyn kiribûn, tevî kerwanek tirkmenên elewî ko  
mal

biribûn Basrayê, nik erebên şî û ji wir vedigeriyan welatê xwe,  
Anatoliya

Navîn, bîr û heşê me bi dîmenên Laliş, Mûsil, Nînova, Aşûr, Bexda,  
Babîl, Firat û Dîcleyê ve tijî, dilê me bi heyecana veşerê keldayî, di  
kêle-

ka çemê Dîcleyê re, ko me hew diwêrbû, em tê re derbas bûna, li  
ser

lêvên min gotinên straneke tewş a coş û heyecanê, em ketin bajarê  
Cizirê.

Min bi çavê xwe yê sax, bi hizir û dîqet, tevî Migo, di pêşiya kerwên  
de,

li doralî fikir. Bajar li ber me bû; xaniyên nizm ko bi kevirên volkanîk  
ên

çiyayê Cûdiyê lêbûbûn, mîna neferên ordiyê şikestî, peregende û  
stûxwar dixuyan; çem di kêleka bajêr re, li herdu milên wî darên tû,  
çi-

nar, bî û spîndar, mîna marekî ko li nêçîra xwe dipiçike, welê bi  
fetloke

diherikî, minareyên dirêj ên mizgeftan ko bi kevirên reş lêbûbûn,  
ber bi

asimên bilind dibûn, keleh û qesir li ser girê kêleka çem, mîna nikulê  
qertelekî, xwe dirêjî avê dikir, çiya, zinar, kendal li milê çepê bajêr  
bêtevger, sakîn, lê mîna ko ew li hêviya tevgerekê bin, maxrûr  
radiwest-

în. Bergeheke têkuz ko hîç tiştekî wê ne kêmbû, mîna neqşên têkel  
ko bi

hev re xalîçeyekê tînin pê, li ber me raxistî bû.

Gava bergeha tekûz, bi reng û şeweyên xwe yên têkel, li ber min  
rabû

govendê, hingê ne bi tenê dilê min bi heyecan hilavêt, herweha  
çavê min

ê kor jî dîsan êşiya. Her cara ko êş dikete çavê min ê kor, min bîr  
dibir ko

hingê daxwaz û arzûyên nû yan jî hîs û bihîstiyariyên nû, nasîn û pêwendiyên nû yan jî bûyer û serpêhatiyên nû li rê bûn. Carina yên baş,

çê û dilşa, carina yên nebaş, kirêt û felaketan. Ez niha »carina çê, carina

164

neçê« dibejim, lê belê piraniya caran, hema çî bigire hemû caran, ên neçê

diqewimîn. Di heyateke bêgav û bîndest de kengî bûyerên çê diqewimin?

Lê îcar, di vegera me de, min ê çî bidîta, çî dê biqewimiya? Danê êvarê

yê wê roja payîzê ko ewçend aram û zelal bû, bergeha bedew a wê rojê ko

ewçend delal bû, bi tenê hîsên germ ên sikûnet, aştî û hizûrê didan însên.

Em ji deverên ko bi hezaran salan ji sikûnet, aştî û hizûrê bi dûr bûn û bi

tofanên mezin ên însanî hilweşiyabûn, dihatin û bi rastî jî me hewcedarî

bi sikûnet, aştî û hizûrê hebû.

Çaxa kerwan ber bi xana bajêr a taxa Medresa Sor ko bi xanên bajarên

Musil û Bexdayê dişibiya çû, me ji tirkmenên nefsbîçûk û dilsoz xatir xwest û em raste rast çûn malê, mala Migo wan, mala Mam Sefo, Armê

û diya wê, mala ko min bêrî lê kiribû û hema çî bigire êdî mala min bû jî.

Haya kesî ji hatina me nîn bû, heye ko wan em ji bîr jî kiribûn, herwekî

ko keldanan gotibû, gava çav çavan nebîne, çav çavan ji bîr dike...

Berî ko



em bigihên malê, li ber dîwarên der ên hewşa fireh a malê, em ji hespan

peya bûn û hefsarên hespan di destê me de, bi hêdîka em daketin hewşê.

Hem ji qata jêr, ji aliyê mitbexê, hem ji qata jor, ji du jûran ronahiya çireyên pêxistî dixuyan û ji banê xênî, ji dûkêşê dûman bilind dibû. Malê

jî, mîna bajêr, haziriya êvarê dikir. Piştî ko me hesp li bexçe girêdan, mî-

na dizên şevê, bêdeng, em ketin hundir, milê mitbaxê. Ji hemû malê bîh-

neke xweş û germ a xwarin, şîv û biharatan difûriya. Sê qewraş li mitbaxê

bi haziriyên êvarê, şîv û xwarinê mijûl bûn. Gava çavê wan bi me ket, pêşî

ew veciniqîn, paşê jî, çaxa wan em nasîn, qîrîniyek ko ez bawer im, ji

kêfxweşî û heyretê dihate pê, bi wan ket. Bi qîrîna wan an jî em bibêjin,

bi hatina me, sikûneta malê ko perçeyekî sikûneta danê êvarê yê bajêr bû,

yekcar têk çû û teşqeleyeke biçûk û xweşik bi malê ket. Keyayê rîhspî û

kal ê Mam Sefo ko ermenekî welatê Wanê bû û hingê li malê dima, qewraşên din ên malê jî hatin mitbaxê, lê herçî Mam Sefo, Armê û diya

wê bûn, ew nedixuyan. Min bi dengekî nizm ji qewraşekê pirsî ka ew li

kû bûn.

Mamo ne li malê ye, qewraş gote min û mîna ko min tişteki nexweş pê

kiribe, bi awireke tûj li min fikir û domand, herçî diya Armê û Migo ye,

ew gelekî nexweş e. Û ez bêjim te, herçî Armê ye, ew ji te xeyidî ye,  
ez

bawer im, ji lewre ew danakeve jêr.

Min dengê xwe nekir, mesele diyar bû. Lê gava Migo bihîst ko diya  
wî

gelekî nexweş e, tafilê, bi axîneke kûr û bi gavên welê sivik ko kesî  
jê nedi-

pa, ew hilkişiya jor, qata diduyan, nik diya xwe. Em gihîştibûn Cizîrê,  
êdî

165

çu lez û beza min nîn bû, min hêdîka girêka sist a doxîna xwe şidand,  
piş-

ta min li keçan, gunikên xwe hinekî mist dan, li mitbaxê li ser sedirê  
kêle-

ka pencerê rûniştim û min hem li keçên xama ko mîna simoreyekê  
bi

çapikî di mitbaxê de dipengizîn nihêrî û hem jî xwarinên ko wan  
pey-

derpey di nav teyfikên biçûk de danîn ber min, mîna ko ez ji xelayê  
der-

ketibim, avêtin devê xwe. Hal, xatir, pirs, gotin li pey hev dihatin.  
Keya

û keçan her tişt meraq dikirin û gotin ji devê hev direvandin. Min jî  
bi

kêf û henek, bêyî ko ez bilezînim, bersîva wan dida.

Rêwîtiya li ser hespê ko ji Mûsilê heta Cizîrê hatibû pê, ez ji hev  
xistibûm; pişta min, stûyê min bûbû mîna minareya mizgefta Nebî  
Nûh

yê qehîm, min nikaribû ew bilivandina. Hêt, qorik û qarçika min  
welê

jan dikir ko qûna min li ser doşega nermik a sedirê jî nedihewiya.  
Herçî

lingên min ên dirêj ko hertim di nav zengoyan de bûn, bûbûn mîna

misas. Min ji dîlberên simore ko li min dinihêrîn û bi şermokî  
dikenyan,  
tika kir ko ew legenekê tijî ava germ bikin û bînin da ko ez lingên  
xwe têx-  
imê û – heke cenabê wan jî dil bike – qahweyekê bidin min...  
Piştî çendekê, ez nizanim ka çiqas, Migo bi rûyekî mirûz û xemgîn  
dakete jêr, serê wî li ber wî, bi gavên giran, hate nik min û bêyî ko li  
min  
feke, gote min,  
Dadê te dixwaze.  
Bi hatina Migo her tişt rawesta, gotin, henek, xwarin, cilweyên  
keçan,  
her tişt. Min bêdeng lingên xwe ko hinekî nerm bûbûn, ji avê  
derxistin,  
ew zuha kirin, ji cîhê xwe rabûm, min cil û bergên xwe hinekî dan  
hev,  
mîna Migo, bêyî ko ez tiştêkî bibêjim, tevî Migo, bi gavên giran,  
xwasî,  
hilkişiyam jor, warê terbiya dil û ruhê min. Çaxa çavê qerweşa ko li  
ber  
deriyê Senemxanê rawestiyabû, bi me ket, wê tiliya xwe bir ber  
pozê xwe  
û xwest ko em bêdeng bin. Em, Migo li pêşî, ez li pey wî, ketin  
hundir,  
mezelê diya Migo û Armê ko jê bîhneke giran a derman û ritûbetê  
dihat.  
Mezela bêhewa loş bû, li kêleka textê razanê, li herdu milan du find  
vêketîbûn, li ser refê kêleka text jî qendîleke ko agirê wî xwe li ba  
dikir,  
ronahiyeke zirav direşand ser textê razanê. Mayrîga qedirbilind ko  
çavên  
wê girtî bûn, mîna her carê di nav nivînên paqij ên spî de razayî bû,  
lê belê

îcar ji her carê bêtir jar û bêhal dixuya. Li herdu milên wê jî du kes hebûn;

li milê rastê, Armê, xwediya lîstikên me yên zêzemînan ko nehatibû jêr,

li kêleka diya xwe, destê Mayrîgê di destê wê de, li ser kursiyekî nizm

rûniştibû. Li milê çepê jî qewraşeke qut û gulover li pê radiwestiya.

Armê di binî re, bi nêrîneke zîz û sîtemkar ko hem ji xem û keserê hem

166

ji xeyd û nazê dihate pê, bi qasî kêliyekê li me nihêrî û paşê dîsan çavê xwe

ji me da alî û li diya xwe nihêrî. Fîstaneke dirêj ê tarî lê bû, rûyê wê ko

gelekî bi rûyê Mayrîgê dişibiya, niha dirêjtir dixuya. Porê wê kintir, çavên

wê biçûktir û stûyê wê ziravtir bû. Çaxa çavê min pê ket, germahiyekê ko

min nizanîbû ka çi bû, bi ser min de hat. Ez hêdîka çûm kêleka wê û min

bêdeng destê xwe dirêjî wê kir. Wê jî, bêgav, destê xwe yê rastê da min.

Min bi herdu destan destê wê xiste nava kefên destê xwe û ew hinekî mist

1. Gava çavên me, bi nêrîneke germ, gihîştine hev, wê bi qasî bîstekê, bi

balkêşî li min nihêrî û dest bi girî kir. Rewş ne çu rewş bû, min destên

xwe jê kêşandin, ez zivirîm ser diya wê û bi dengê nerm min gotê, Mayrîg, ez hatime, Biro...

Mayrîgê ko hêdîka nefes digirt û dida, bi zehmetî, çavê xwe vekir û li

min nihêrî. Piştî ko wê fêm kir ka ez kî me, bi kenekî nerm, li min nihêrî.

Lêvên wê jî liviyan, lê ji lêvan çu deng derneketin. Paşê çavên wê dîsan

hatin girtin. Xaça wê ya spehî û Încîla Îsa Mesîh ko ez welê bawer im, di

hemû heyata wê ya nexweş de mîna dermanekî sikûneta manewî bûn,

dîsan li ber serê wê bûn.

Mayrîg, dîsan min gotê, ez, Biro... Mozîk...

Di wan salên min ên zaroktiyê de ko min hê hay ji çerxa felekê nîn bû,

ji ber dînîtî û teşqeleyên min ên bêrawest, Mayrîgê ko hingê li ser piyan

bû û dikarîbu bikeniya, navê mozîk ko ne ga ye, ne jî conega, lê xwe di

ser hemûyan re dibîne, li min kiribû. Da ko ez bikaribim hewayê ziz a

mezêl hinekî biguherînim, min dil kir, navê mozîk bi bîra wê bînim.

Lê

belê jê çu bersîv an tevger nehat. Dewsa wê, Migo ko êdî bi qasî bergirekî

girs bû, bersîv da,

Mozîk!.. Tu û mozik... mozîkê ko êdî ne bi tenê ji conegayekî herweha

ji gayekî jî mezintir e!..

Bi qasî çendekê ez li mezêl, li ber serê Mayrîgê rawestam, lê paşê, hêdî-

ka, ez ji mezêl derketim û bi gavên giran çûm kitabxanê, warê ko hertim,

mîna siya min bi min re bû û rê şanî min dida. Kitabxane tarî û hewayê

wê giran bû. Ez rasterast çûm û min deriyê şaneşînê vekir,  
hewayeke  
paqij ê êvaran, tevî ronahiyeke qels a stêrên qels ên destpêka êvarê  
rijiyan  
hundir. Dengê Dîcleyê û dengê bilûrekê ji nêzîk ve, dengên têkel ên  
ba-  
jêr ji dûr ve dihatin. Piştî ko min qendîl vêxistin, yek di destê min de,  
ez  
di nav kitabxanê de, gav bi gav çerx bûm; ref, kitab, mase, kaxiz,  
pênûs û  
kitabên li ser masê, dîwan, kursî, lewheyên dîwaran, xalîçe û  
mehfûrên  
erdê, her tişt li cîhê xwe yê berê bûn, – bêguman ji bilî wan nexşe û  
167  
kitabên ko min û Migo bi xwe re birûbûn û di ava çemê Dîcleyê de  
gêr  
kiribûn. Ez çûm ber lewheya teyrê tawis û destê min li ser kevirê  
teyrê  
tawis ko li stûyê min bû, lê nihêrî. Teyrê tawis... melekê tawis...  
teyrê ko  
di destpêkê de cîhan li ser baskên xwe gerandibû... melekê ko însên  
ji  
kirêtî û xirabiyê diparast. Çiyayê Şingalê, Laliş, êzidiyên geliyê Lalişê,  
şêx,  
feqîr, qewal... hemû hatin bîra min.  
Kitabên Naso, Keso, Maro? Ez çûm ber refên ko ew kitab lê bûn, ew  
jî  
li ser refan, li kêleka hev rêzkerî bûn. Min rahişt kitaba Keso da ko  
wê  
rûpelê ko tê de dîmenê çem hebû, vekim. Gava min rûpel vekir,  
kulîlkeke beybûnê ya hişkbûyî jê ket.  
Beybûna min, bi keserekê, min gote û min rahişt wê û min ew ji  
erdê

rakir. Min beybûna ko êdî bi bîhna ax û giya nedifûriya, berî çend salan,  
xistibû nav wan herdu rûpelan û welê dixuya ko ji wê rojê û pê ve kesî  
rûyê kitêbê venekiribû.  
Bi ronahiya qendîlê min ji nêzîk ve, bi dîqet, careke din, li rûpelê kitabê  
û dîmên, çemê har, însanên tirsîyayî, keleka ko diqulipî, nihêrî.  
Keso, min dengê xwe bilind kir û got, Mam Keso... min jî ev dever hemû dîtî,  
ez jî bûm şîrîkê qedera te û hevalên te, keleka me jî weha  
qulipî, em jî weha qîriyan... dinya bi dor e, Mam Keso, ne bi zor e.  
Piştî  
te bi qasî du hezar û sê sed-çar sed salan, ez jî çûm wan deveran û min şaş-  
mayî dît ko ew dever her mîna xwe ne, mîna ko te ew li pey xwe hîştibûn.  
Min ê gotina xwe hîn jî dirêjtir bikira û ji rûpelê vekirî ya kitabê re qala  
rêwîtiya xwe û tecrubeyên xwe jî bikira, lê bi dengê tîz ez li xwe war-  
qilîm.  
Te kê li pey xwe hişt, belqityo, tiredîno!  
Armê bû.  
Armê, min gotê û ber bi wê ko li ber derî rawestabû, çûm, Arme, canê,  
tu neheq î.  
Ez neheq im, wê got û xwe da alî, tu biheq, ez neheq! Ev bûn çend sal  
ko tu weha wînda bûyî û çûyî?  
Ez hertim li te difikirîm, min, qendîl di destê min de, li kêleka wê rawestiyam û gotê...  
Derew... hosteyê derewan... şixulê te jixwe hertim derew e.

Na, bi serê te be, bi serê Mayrîgê be, na.  
Çi na? Tu dixwazî çi bibêjî, sextekar?  
Te çima mûyên xwe hilnekirine? Min gotê, da ko ez bikaribim  
meselê  
biguherînim û hêrsa we daxim. Mûyên pî û çîpên wê di ronahiya  
qendîlê  
168  
de, li ser beden û laşê wê yê spî reş dikirin. Bîhneke ko bi bîhna  
miskê  
dişibiya, jê dihat. Bejna wê zirav, memikên wê biçûk, hêtên wê  
teng,  
çîpên wê sist bûn, lê tiştêkî ko min jê fahm nedikir, xweşikî û  
bedewiyêke  
taybetî didayê û kela min a hez û hezkirinê radikir.  
Na axpara min, na... min bi ken gotê û gotina axparê ko bi zimanê  
er-  
menî dihate maneya xweşikê, lê zêde kir û ji nişka ve, bi destê xwe  
yê  
serbest min ew hembêz kir û stûyê wê yê zirav maç kir.  
Serserî, wê gote û xwe vekişand, çavê te yê din ê jî, ji ber van derew  
û  
lîstikên te, kor be... tu dê bibînî, tu dê ji herdu çavan jî bibî, koro!  
Belê, koro...  
Ev dengê nû jî, yê Migo bû, ew jî hatibû kitabxanê.  
Koro, bavo xeber şandiye, Migo domand, ew li nik Mîr e, piştî ko  
şix-  
ulê wî tamam be, ew ê were, divê tu bi cîhekî de neçî. Paşê wî  
xweha xwe  
jî hilda û vegeriya mezelê Mayrîgê û ez dîsan li kitabxanê bi tenê  
mam. Ez  
westiyayî û sersem bûm, ji cîhanekê ko ji rêwîti, geşt û gerê hatibû  
pê, di-



hatim û diketim nav cîhaneke nas ko ji derd, keser, nexweşî û  
bêgaviyên  
rojane dihate pê. Lê min taqet nîn bû ko ez li tiştê bifikiriyama.  
Min  
dîwana ko li koşê bû, kêşand û anî ber maseyê, du qendîl danîn ser  
masê,  
li dîwanê pal da û peregende li rûpelên kitaba Keso û dîmenên di  
nav  
rûpelan de fikir û welê di xew re çûm.  
Gava ez bi dengê qert ê Mam Sefo hişyar bûm, êdî berbangê lêdabû  
û  
dinya ronî bûbû. Ez qerisîbûm, min deriyê şaneşînê vekirî hîştibû,  
çu tişt  
navêtibû ser xwe û welê di dîwana teng de, çogên min di ber zikê  
min de,  
nivîstibûm.  
Biro, kurê min...  
Mam Sefo, Migo, keyayê Mam li ber serê min rawestiyabûn û bi ken  
li  
min dinihêrîn. Dengê Mam Sefo yê toq mîna lorînekê bû; rûyê wî yê  
biken, rawesta wî ya maxrûr, bedena wî ya girs, simbêlên wî yên  
boq, zi-  
manê wî yê şêrîn, gotinên wî yên balkêş... belê min bêrî li Mam  
kiribû.  
Min xwe da hev û ez çûm destê wî, lê wî ez hembêz kirim û ji eniya  
min  
ramûsa.  
Hingê ez giriyam.  
Piştî ko ez çûm avdestxanê, bi qasî çendeke dirêj min mîz kir û bi dû  
re  
dest û rûyê xwe şuşt, ez çûm mitbaxê, nik Mam. Taştê hazir bû,  
çend

celeb penêr, şîr, mast, nanê germ ê sêlê, hêk, to, nivîşk, çend celeb se-

bzeyên teze... her tiştê ko diviya li mala Mam Sefo hebûya, li ber me bû.

Mam, Migo, keya û ez, em li sifrê rûniştin. Ez gelekî birçî bûm, bi rûnişt-

169

inê min mîna gurekî birçî dest bi xwarinê kir.

Bixwe kurê min, Mam Sefo gote min û teyfikine tijî ber bi min kir, kurê min, eve penêrê pûngê ji deverên Hekaran e, eve penêrê sîrik ji de-

verên Wanê ye, bixwe...

Min ji Mam Sefo hez dikir, min ji penêrên sîrik û pûngê û ji spêdên ronî yên Cizîrê hez dikir... Nefes li min çikiyayî, gepeke mezin di devê

min de, biken, min li Mam Sefo nihêrî; eve însanê bejndirêj, lê ne mîna

misas, ez hingê fikirîm, bejn û balxweşik, lê ne mîna şitil, ji bervajiyê xan-

ima xwe, zînde, hem bi beden hem bi heş û mêjî, sakîn, bîrbir. Bedeneke

xurt, tendirustiyeke têkûz, mil, pî û lingên ko di dahl û deviyên, di çiya û

zozanan de bûne mîna pola, bihîstiyariyeke nazik, salên bajarên mezin ên

welatên Rom û Frengan ko dewlemendiyeke bêpayan daye heyata wî ya

rojhilat. Xwediyê kitabxana yekta ya welatê Botanê, siwarê hespên kihêl,

xwediyê şûr û xencerên duban ko ji polayê nêz çêbûbûn... Pispore, aqil-

mend. Comerd. Ciwanmêrekî balkêş, mîna lehengekî ko ji dewr û dewranên Babîl û Nînovayê maye...

Hingê, di wê berbanga sibê de ez têgihîştim ko min Mam Sefo ne bi tenê mîna mamekî yan jî zirbavekî, lê herweha mîna tîmsala heyata xwe jî hilbijartibû. Di heyatê de, hertim, herkes hin kes û tiştan ji bo xwe û heyata xwe tîmsal hildibijêrin. Min jî ev zilamê hanê ko bi qasî maxruriya xwe, bi nefsbîçûkiya xwe, bi qasî dengê xwe yê toq û tevgerên xwe yê xurt bi ziravbihîstiyariya xwe jî nas bû, hilbijartibû. Mam Sefo ko gelekî westiyayî û bi endîşe dixuya, nû ji qesra Mîr hati- bû. Me hersiyan jî dil fikir ko ew here û binive, lê ew neçû. Ewî rêwîtiya me meraq fikir û her tişt, kite bi kite dipirsî. Taştêya me ya dewlemend gihîşte nîvroyan û piştî firavînê ko me li mitbaxê xwar û keya ji bo geran- dina şixuline malê çû bajêr, em jî hilkişiyar jor, kitabxanê. Bi qasî çen- dekê Mam çû nik xanima xwe, lê ji bilî wê, em danê êvarê jî, li kitabxanê her axivîn. Danê êvarê, çaxa tîrêjên tavê mîna mirtalan xwe dirêjî hundir kirin û li hundir huzmeyeke zêrîn anîn pê, hingê Mam Sefo bi destê min û Migo girt, em birin şaneşînê û piştî ko em li ser kursiyên nizm rûniştin, gote min û Migo, Xortno, niha li min guhdarî bikin. Hûn çûn, we gelek tişt dîtin, ders û tecrubeyên nû li umrê xwe zêde kirin û hûn vegeriyan nav refê xwe.

Destûra min a heyatê ev gotina hanê ya bav û kalan e; kew qenc e,  
bi re-

fê xwe re... û herçî refê me ye, ewrên reş doralî lê girtine, êvar  
daketiye û

herwekî ko hûn jî pê dizanin, şeva tarî ji êvarê kifş e. Ne bi tenê  
mîrekiya

170

Cizîra Botanê, herweha hemû welat ber bi geremoleke kûr ko dê  
her tiştî

daqultîne û şewateke xedar ko ter û şîl tevde dê tê de bişewitin,  
dere. Şeva

tarî, diz bi hezarî, xortino, gotina min eve ye ko hûn divê bi tevdîr  
bin...

Piştî van gotinên ko tişteki zêde jê fêm nedibûn, Mam Sefo bîhnek  
ve-

da, agirê qelûna xwe nû kir, bi qasî bîstekê li çêm nihêrî û paşê li  
me, bi

dîqet nihêrî û domand,

Dewleta Osmanî gav bi gav dorê li mîrekiyan teng dike, paşayên  
Diyarbakir, Bexda, Mûsil û Sîwasê tixûbên hukimdariya xwe firehtir  
dikin, fesad û sîxur di nav eşîr, ehl, terîqet û navçeyên welêt de, bi  
dizî, di-

gerin, pisepisê dikin, derew û fîtneyan belav dikin. Misilman, file,  
cihû ji

hevûdu bi dûr dikevin, qise û gotinên nexweş di navbera wan de  
derin û

tên. Û navenda van hemû tiştan jî bajarê Cizîrê û mîrekiya Cizîra  
Botanê

1. Bajarê Cizîrê, Mîrê Botan û mîrekiya Cizîra Botanê bûye stirî û  
ketiye

çavê herkesî. Heke Mîr aştiyek di navbera eşîr, navçe û ehlê welêt  
de

neaniya pê, rewşa xelkê baş nekira, ber bi yekîtiyeke têkûz gav navêta,  
hingê wî dê ewçend bal nekişanda... Her roj qasid û xeberguhêz derin û  
tên, niwênerên dewleta Osmanî, dewleta Farsî, dewletên Ewrûpî derin û  
tên. Em, Mîr û hevalên wî her roj dicivin û heta sibehan li ser vê çûyina  
kirêt dipeyivin... Rewş ne baş e, xortino, ehlê me nezan, eşîrên me hov,  
rêberên me yên cimetan serhişk in. Însanên me ne bi zanîne, lê bi şûr û tiv-  
ingên xwe bawer dikin û şûr û tiving ko eve çendek e jengîn in, dikarin ji  
nû ve ji kalanan bikêşin û biteqin. Ê ji bîr mekin, dengê şûr û tivingan li  
her derê, hertim dengê edalet, wîcdan û merhemetê dikuje. Îhtimaleke  
mezin e ko xwîn birêje û gava xwîn rijîya, êdî çu kes nikare rê lê bigire.  
Hingê daxwaza tolê ko ji hezaran salan û vir ve kahniya herî xedar a mûsî-  
bet û felaketên hemû Mezopotamyayê ye, dê dîsan vejê. Tol ê serî hilde,  
însan ê ji tolê medet bipên, dîsan bi tolê bawer bin, tol ê mîna nexweşiyeye  
xedar hemû welêt vegire, kur ê bibe dijminê bav, xwarzî xal, birazî mam.  
Ji lewre xortno, divê hûn di her hal û mercê de bizanibin ka serê we li ser  
kîjan balîfê ye û hûn ê çî bikin û heyata xwe çawan bi rê xînin...  
Dengê xwarzî û biraziyan ko Mam Sefo qal dikir, min di êrîşa kambax a

ordiya osmaniyan de ko li dijî keleha Seîd Begê bû, matmayî, bi hawar

û olan bihîst. Herwekî ko bav û kalan gotiye, mûsîbetek ji hezar nesîhetê

çetir e, min jî bi mûsîbeta vegirtina keleha Seîd Begê dît ko kîn, rik û to-

la axa Mezopotamyayê, belayê serê Mezopotamyayê ye û ne kesekî din

lê rik û kîna însanên Mezopotamyayê însanên vî welatê mibarek têk 171

dane û hê jî têk didin.

Çîroka malbata Mîr û ehlên wî gelekî dirêj e û mîna her çîroka ko bi tenê bi xurafe û rîwayetan tê vegotin û vediguheze nifşên nû, tê de rastî û

şaşî di nava hev de ne. Tê de çî rast e, çî nerast e, çî hatiye pê, çî lê zêde

bûye, însan nizane. Û herweha dîsan mîna hemû çîrokên ko berdevkiya

hukimdarên dikin û tê de hertim valahî, sir û cîhên veşartî hene, li gora

daxwaza dilê kesê li ser hukim e, tê hûnandin. Binemala Mîr gelekî kevnare û tevîhev, gelekî gumreh û mîna dareke qedîm a tûyê stûr bû, –

ko çu kes nikare hemû bav û bavikên wê bihijmêre. Mil û şaxên malbatê

digihîştin hemû welatên jêr û jor ên Mezopotamyayê. Herçiqasî mezinên

malbatê dil bikin ko reh û rêçên xwe geh bigihînin malbata Mihemed

Pêxember, geh Xalidê bîn Welîd, geh Selahedînê Eyubî jî, herkes van

gotinên hanê mîna rîwayetek ji rîwayetên hûnandina çîrokeke serfiraz a

neqîşandî dibînin. Lê belê heke ne weha be jî, ji malbatê re »ezîzî«  
hatiye  
gotin û hema çî bigire hemû însanên malbatê, hema çî bigire hertim  
sofî  
bûne. Gerçî Mîrê ko hertim di destan de tizbiyeke dirêj hebû, bi  
ayet,  
dua, rîwayet û gotinan bawer bû û di dawiya umre xwe de, çaxa wî  
êdî  
her tişt, mîrîtî, mîrekî, welat, mal, malbat, dost, ehl winda kirin, li  
welatê  
xerîbiyê, xwe bi temamî spart ayet û duayan, di eslê xwe de, ne  
ewçend  
dîndar bû, lê ji malbatê gelekî dîndar, alîm, şêx û meleyên navdar  
derke-  
tine. Jixwe ji navê bav û kalên Mîr ji dîndariya malbatê diyar dibe;  
Şeref  
Xan, Mihemed Xan, Mansûr Xan, Smaîl Xan, Mistefa Xan, Evdal Xan  
û  
herweha...  
Li gora rîwayetên ko ji devekî veguheziyaye devekî din û ji wir jî  
devekî  
din, piştî ko bavê Mîr, Mîr Evdila wefat dike, pismamê Mîr, Seyfedîn  
Beg tê ser hukim, lê ew nikare şixulên mîrekiyê bi rêk û pêk  
bimeşîne, ji  
lewre jî malbat wî ji mîrîtiyê bi dûr dixîne û birayê mezin ê Mîr, Salih  
Beg  
dikeve dewsa wî. Lê ji ber ko Salih Beg ko min jî nas dikir, gelekî  
dîndar  
bû, wî jî cihê xwe da birayê xwe yê kicik Mîr Bedirxan. Lê belê tevî  
ko şix-  
ulên mîrekiyê weha dimeşyan, hertim di navbera bav û bavikên  
malbatê

de berberî û dexesî hebûn û çavê herkesî li mîrîtiyê bû. Belê, tevî ko  
ki-

rasê hukimdariyê pirî caran dibe kefenekî tijî xwîn, herkes li pey wî  
kirasî

ye û ji bo kirasê hukimdariyê berberiyê ke kûr hertim di navbera  
mala

Mîr û pismamê wî mala Seyfedîn Begê de hebû.

Heke em niha vegerin ser çîroka xwe û Seîd Begê, divê hûn, berî her  
tiştî bi vê yekê bizanibin; Seîd Beg ko yek ji begên herî berbiçav ê  
welatê

Cizîra Botanê bû, pismamê Mîr û xalê hevalê me Yezdînşêr bû. Ne  
bi

172

tenê evçend, lê belê ji bo ko hûn bêbextî, dijminahî û kambaxiya  
heyata

me ko bi bêgavî û peregendehî derbas bû, baş têbigihên, dive hûn  
vê yekê

jî bizanibin; Yezdînşêr ko hevalê min, Migo, Heme û Têlî bû, kurê  
Seyfedîn Begê ko ji hukimdariya mîrekiya Cizîra Botanê hatibû bi  
dûr

xistin, bû. Tevî ko bav û kalên Mîr û Seîd Begê welatê Cizîra Botanê  
di

navbera xwe de parve kiribûn da ko şer û berberî çênebin, hertim  
heke şer

nebe jî, berberiyê ke pirî caran nevekirî hebû. Mîr û bavê Yezdînşêr  
Seyfedîn Beg pismamên hevûdu bûn. Yezdînşêr û kurê Mîr Têlî yê ji  
her-

du çavan kor ko herdu jî hevalên min bûn, pismamên hevûdu bûn.  
Yanî

xwarzan xal rakiribûn, birazan mam winda kiribûn û heyata însanan  
û

herweha tarîxa mîrekiyekê û heye ko tarîxa welatekî jî di navbera  
mam û



birazî, pismam û xwarziyan de ber bi felaketan gêr dibû.  
Min tovên vê felaketê ko ji xwestek û mirazên rind, lê ji netîce û seren-  
camên kirêt dihate pê di êrîşa keleha Seîd Begê de dît. Min di wê gava  
yekemîn a felaketan de dît ko qedera me, ji vê yeka hanê pê ve ne tiştêkî  
din e; mîna rûviyê xinis em ê jî hertim li tiriya sor a kemilî bifikiriyana, lê  
me dê çu carê xwe negîhanda tiriye; me dê bi xewn, xeyal û azrûyên herî  
çê dest bi kar û şixul bikira, lê di netîcê de, ji bo ko me bikaribûya heyata  
xwe ya teres bidomanda, me dê hewl bida ko her tiştê xwe, heta xeyala  
xeyal û xewnên xwe yên destpekê jî, ji bîr bikira, me dê, ji ber jana tecrubeyên me û tirsaya heyatê, her tişt, heta xewnên çê jî li xwe qedexe bikira.  
Lê belê berî ko ez gotinê bînim ser êrîşê, ez ji we re behsa bûyerek ko  
bêtir li vê şeva me ya ronî tê, bikim, bûyerekê ko xwediya wê we jî, min  
jî ji bîr kiriye; Gulîzerê.  
Dengê Gulîzerê ko min ji bîr kiribû, ji nû ve, sê roj bi dû hatina me re,  
careke din, lê îcar di destpêkê de mîna çêr û nifir, bi guhê min ket.  
Ji ber çûyin û hatina boş û xwarin û vexwarina xweş a mala Mam Sefo, ders û  
şîretên wî, dengên ko ji kitabxanê bang li min dikirin û nexweşiya diya

Armê, ez bi qasî se rojan li wir mam. Lê piştî sê rojan, bêguman piştî  
ko  
ez û Migo, em çûn hemama herî xweş a bajêr ko lehîten wê yên spî  
yên  
hundir mîna eywanekê lebûbûn û mîna kevirên firûnekê germ bûn,  
bi  
alîkariya çend qalib sabûn û telaqên hoste ko her yek mîna fêris û  
pêhle-  
wanekî bi gewde bûn û bi kîsên destên xwe ne bi tenê toz û gemarê,  
her-  
weha çermê însên jî radikirin, me hemû toz û kirêtiya çola  
Mezopotamyayê ji ten û bedenên xwe avêtin, min, di nav cil û  
bergên nû

173

de, simbêlbadayî, maxrûr û qure, mîna ko min bi gera xwe ya  
Mezopotamyayê dinya vegirtibe, li ser lêvên min gotinên stranekê,  
li  
kêleka çem, di bin siya darên qedîm ên çinar, çilo û tûyan re, berê  
xwe da  
mala Apê Xelef.

Di wan sê rojên min de ne Apê Xelef hatibû mala Mam Sefo, ne jî  
Heme û Gulîzerê. Keyayê Mam gotibû min ko Apê Xelef, tevî  
panzdeh-

bîst şivanan û keriyên pezên Mîr, Mam û begên Cizîrê, derketibû  
zozanan. Lê çima Hemeyê fistûj ko Xwedê dizanîbû ka li kû çi  
fesadiyê

dikir, nehatibû? Gulîzera gulî reş û dirêj ko bi bejn û bala xwe êdî  
qulipîbu ser Stiya narîn û dilsoz a destana Memê Alan? Çima ew  
nehati-

bûn? Ne mimkun bû ko wan nebihîstibû ko em vegeyabûn, lê heye  
ko

wan xwe li keriyê danîbûn? Axir, her çi bûya jî, ez niha li rê bûm,  
heyat

mîna her carê, dîsan xwe dubare dikir, ez dîsan di danekî êvarê de,  
li ser  
riya ko min bi hezaran caran gav kiribû, çavê min li ser lîstikên  
tîrêjên  
tavê ko li ser çêm diçirûsîn û ji zaroktiyê û vir ve, min hertim, lê  
şahidî  
kiribû, ber bi mala ko ez lê mezin bûbûm diçûm, – da ko min hevalên  
ko  
rûyê wan aşîna bû û ez pê re mezin bûbûm, bidîta.  
Gulîzerê, mîna gelek caran, dîsan li ber deriyê mala ko li kêleka çêm  
bû  
û bi lorînên çêm dikete xewan û bi vîçevîça teyran ji xewan hişyar  
dibû,  
li ser kevirê ber derî rûniştibû û di destan de teşiyek, li ser çogê jî  
lûfikek  
dirêj ko nîşan dida ko Gulîzerê ne ji bo henekî, lê ji bo şixulekî girîng,  
bi  
şixulê destê xwe rabûbû, hirî dirisand. Fîstaneke tenik ê sade û  
rengîn ko  
heta ber lingên wê daketibû, lêbû. Guliyên wê îcar nîn bûn, wê porê  
xwe  
veçirandibû û berdabû ser milan û porê ko pêl dida, li ber tîrêjên  
tavê bi  
rengê çîkî reş, bi şox û şeng dibiriqî. Gava min şekl û şemala wê  
dît, ez  
sekinîm û bi qasî çendekê, ji dûr ve, min lê nihêrî. Germahiyek ko ez  
bawer im dilhebînî bû, bi ser min de hate. Gelo min ji vê keça xama  
û be-  
dew ko êdî mîna porê xwe yê leylandayî şox bû û li ber vê mala  
neçar ko  
êdî jê ne bîhna tir û fisandî hate, ne jî dengê stranên şivanekî kal ê  
şên,  
rûniştibû, hez dikir?

Bi dengekî berz ez kuxiyam û ber pê çûm. Hingê çavê wê bi min ket  
û

li ser rûyê wê tevgerek ko min jê dernexist ka çi bû hate pê.  
Heyecan?

Coş? Hêrs? Kerb? Tafilê wê rûyê xwe ji min bada û teşiya destê xwe  
vizand û bi lingê xwe, mîna ko ew tiştêkî pihîn bike, wê guloka  
pengê ji

xwe bi dûr xist. Ez bêdeng çûm nik wê û li ber wê, li pê sekinîm. Ne  
deng

ji min derdiket, ne ji wê. Êvar dadiket, dengê şivan û berîvanên ko  
pez

haş dikirin, ji dûr ve dihat; dengê zompê hesinkerekî, mîna awazê  
deng-

174

bêjekî kal, bi dûzan û aheng, li ber guhê me diket; ber bi milê çiyayê  
Cûdî, siwarek hespê xwe rakiribû çargaviyê û di nav kortalên  
zinaran de

winda dibû; bayekî sivik ê êvaran pelên darên tûyê ko hinekî ji me  
bi dûr

bûn, difirkandin û çiqil û pelên daran hêdîka diliviyên; ava çem ko  
bi

tîrêjên tavê qulipîbû ser rengêkî sor û zer, bi aramî diherikî. Û di nav  
wê

aramî û sikûnetê de Gulîzer ko ez bawer im, ne aram bû, bi tevgêrên  
sert

teşî dirisand.

Roja te, na ne roja te, êvara te bixêr, Gulîzerê, min bi dengê xwe yê  
herî

nermik û xweşik gotê.

Lê wê ne bersîv da min, ne jî li min nihêrî.

Gulîzerê, zimanşêrînê, tu çawan î? Min dîsan gotê. Min bîr dibir ka  
çi

dê ji zimanê wê birijiya û loma min »zimanşêrînê« li gotina xwe zêde

kiribû û bêyî ko ez li bendî bersîveke bisekinim, min gotina xwe do-  
mand, welê dixuye ko te bihîstiyê ez hatime û tu dê, ji bo min, tiştekî  
zivistanê birisî?

Hingê wê bi awirekî gelekî tûj li min nihêrî û gote, belqityo!

Zimanşêrînê gotina xwe dubare kir; belqityo.

Bi tenê hewqas, lê belê ew gotina wê ji bo min, mîna dilopa şîr zelal,  
şêrîn û germ bû. Kenekî li ser rûyê min, min bi baldarî lê nihêrî; rûyê  
wê

yê esmer hinekî zirav û gelekî lihevhatî bû, porê wê ko ji dûr ve mîna  
pêlên çemê Dîcleyê dixuyan, mîna tûlekî hevrêşimî yê nerm bû,  
tenê wê

spî, çavên wê yên kilkirî xweşik û kûr, mijang û birûyên wê dirêj û  
mîna

kevanekê vekîşiyayî bûn. Dest û lingên wê henekirî, mijangên wê  
yên reş,

bi kilê, reştir bûn. Jê bîhneke gelekî xweş ko bi bîhna misk û emberê  
dişibiya, difûrî. Çend qumçikên jor ên fîstanê wê vekirîbûn û jê  
pêşîrên

wê yên gewher hinekî dixuyan. Tevî ko ew li ber derî rûniştibû û teşî  
dirisand, ji kil, hene, bîhn û qumçikan diyar bû ko ew li hêviya yekî  
yan

tiştekî bû.

De ka bibêje, ez hinekî din nêzîkî wê bûm, di ser re min li pêşîrên  
wê

yên şox nihêrîn û min jê pirsî, tu ji min re çî dirisî?

Koro, çavhelisiyo, kezebreşo, wê bi hêrs gote û rabû ser xwe, teşî û  
hirî

avêt erdê û rûyê xwe bada, kete hundir. Lê berî ko ew bikeve  
hundir, wê

dîsan nifireke din li min barand, malşewitiyo, tu bî, tu ji çavê din jî  
bibî,

tu bî, tu muhtacê garisê gilgilî bî.

Ka Heme li kû ye, zarşêrînê, min gotê û çavê min li ser hêtên wê yên vekîşiyayî, min bi hedîka da pê.

Ez çi zanim! Ew jî dînekî mîna te ye, ji mêj ve ye, ew naxuyê, kî dizane

175

di kîjan medrese yan jî mizgeftê de niha dijûnî filehan dide! Yek tiredînekî serserî ko nanê kuçan ketiye zikê û venagere mala xwe, yek jî

gêjekî sersem ko bi zekata xelkê zik mezin kiriye û mala xwe ji bîr kiriye!

Yek ji yekî xirabtir.

Lê binihêre, tiredînê te hat, min gotê û ber bi wê çûm. Bejna wê ji min

kintir, endama wê, bêguman, ziravtir bû. Bedena wê ya narîn kela min

rakir da ko ez wê bibest hembêz bikim û parsûyên wê bi herdu destan

biguvişînim.

De bicehime û here cîhê ko tu jê têtî, wê xwe hinekî da alî û gote.

Dengê wê ko tijî hêrs bû, bi min mîna dengê berxikekê yan jî mîna dengê şalûrekê dihat; ewçend masûm, delal û zelal. Dengê wê, bîhna wê,

bala wê heş ji min bir, min hew dikarîbû xwe rabigirta.

Nazdara min, min gotê û bi leza birûskê êrîşeke xedar birê, bi herdu destên wê girtin û ew xiste erdê. Pêşî ewê, di bin min de, mîna pilingekî

ko dixwaze cewrikên xwe ji keftaran biparêze, bi xurtî li ber xwe da, lê

paşê, gava ewê fahm kir ko ew nikare xwe ji penceyên min ên qehîm riz-

gar bike, bedena wê di bin bedena min a qelew de sist bû. Bi sistiya be-

dena wê dengê wê jî hate birîn. Min jî hew deng kir, deng êdî ne hewce  
bû, niha diviya me li dengê hilavêtina dil û tevgerên beden an guhdarî  
bikira. Li ser mehfûra tenik, ez û wê, bi hev re yekbûyî, em li erdê dirêj  
bûbûn. Min hêdîka destê xwe yê rastê bir porê wê, rûye wê ko ji min  
zivirîbû, rast kir da ko ew li min, li rûyê min, li çavê min ê kor û şopa şûr  
ko mîna pîneyekê li ser rûyê min bû, baş binihêre.  
Li ser rûyê wê, di nav bîbikên çavên wê keça xama de nermahî, germahî  
û hêvî hebû. Hêviya evîn û evîndariyê ko ew hertim, di hemû heyata xwe  
de hewcedar bû, hêviya hez û şefqatê ko wê ji mala bêdayik û ji bav û bi-  
rayê xwe nedîtibû, hêviya kêfxweşî û coşa yekîtiya beden an ko ew bi se-  
bir û metanet hertim, ji wan lîstikên me yên zaroktiyê û vir ve, li pey bû.  
Ew lîstikên masûm niha qulipîbûn ser tiştêkî din ko ne min û ne jî wê  
dizanîbû ka ew ê çawan kuta bibe. Belê, li ser bîbikên çavên wê hêviya ko  
bang dikir û digot »were« hebû, lê li milekî din jî hişkahiyeke, ez çi dizan-  
im, heye ko sertiyek, xurtiyek jî hebû. Xurtiyek ko bi stranên bavekî şî-  
vanê êzidî kemilîbû, bi nanê tisî û şîrê xav perwerde bûbû û bi feqîrî  
û neçarî hatibû ceribandîn.  
Çavan digot, were, koro, çima çavê te yê sax min nabîne, were, niha

heke tu weha bi hemû giraniya xwe li ser min î û nefesê li min  
diçikînî,

ne ko te xwest, lê ji ber ko min rê da, weha ye. De were, her tiştî ji  
bîr bike,

176

her tiştê ko te dîtîye û tu jiyayî, li pey xwe bihêle û were...

Her tişt li pey mabû, niha bi tenê rastiye ko min pirî caran lê xeyal  
kiribû, hebû; ew. Fîstanê wê yê rengîn, rengên sor, zer, kesk, mor  
ko

keçên kurdan jê hez dikin, bişkovên fîstên ko heta navika wê ber jê  
dibûn û mîna wê li hêviya vekirinê bûn, mûyên zirav ên pî û çipên  
wê ko

tenê spî û bedena esmer dixemilandin, stû û gerdana wê ya dirêj ko  
li

hêviya ramûsanana bû, şeqên we yên vekirî ko bi hêdîka xwe  
dilivandin û

heş ji min dibirin û çavên wê, çavên reş ko niha bi baldarî û kûr,  
gelekî

kûr li min dinihêrîn. Niha li ser çavan çi dixuya? Ken? Lava? Coş?  
Ferman? Heye ko hîç tişteki, heye ko hemû tişt di nava hev de...

Eniya

wê fireh û li serê çu xêz, qermîçek an nîşandekên wext û felaketan  
nîn bû.

Enî, serî, mêjî hê pêrgî felaketên ko li rê bûn, nehatibû. Lê hingê ne  
heşê

min li bûyeran bû, ne jî heşê wê li tevgerên rojê bê bû, hingê bi tenê  
ew,

rastiya wê hebû. Ji wê danê êvarê, ji destpêka dengên bedenana ev  
bergeh,

bi hemû zelaliya xwe, di heşê min de maye.

Dengê bedenana dest bi axaftinê kirin, wê hêdîka, bêyî ko min ji ser  
xwe



biqulipîne, ez nizanim ka çawan, lê bi hunereke bêpayan, dest û milên  
xwe ji fîstên rizgar kirin, bi dû re bi destên min girtin û ew birin ser qumçikan. Qumçik yek bi yek vebûn, ji jor, ji memikan ber bi jêr, ber bi navzik. Niha ew heta berzikê tazî bû, di bin fîstên de wê çu tişteki din li xwe nekiribû, memikên gulover û hinekî mezin ko hemû sîng tijî kiribûn, bi hemû gewherî û bedewiya xwe dixuyan. Wê hêdîka destên min birin ser memikan, dest, bêyî lez û bezê, li ser memikan, li dora wan gerian, bi dû re, dîsan bi alîkariya wê, dest ber bi jêr, ber bi aliyê navikê bûn. Wê zikê xwe hinekî vekişandibû û navik bi kortahiya xwe mîna yaqûteke belek a çirûsî dixuya. Yan jî mîna libeke tiriya kemilî ya tah-nebî. Hêtên wê ko hê destê kesî lê neketibû mîna qûna topên osmanî gulover û sert, lê di eynî wextê de mîna meşkên kelekên kambax ên Dîcleyê nerm bûn. Dengê hêviyê ji hêtan jî olan dida; hêt li hêviya destan bûn. Şeq û çîpên spî ko di paş re mîna marekî li min piçikiyabûn, mîna mirtalên şervanên aşûriyan dirêj û lihevhatî bûn. Heta navik û hêtan her tişt baş bû, lê malkambaxiyê ji wir û pê ve dest pê kir. Tevî ko destên wê dîsan aliyê min dikirin, min kir-nekir, nikarîbû fîstan jê bikira. Ê ya herî xirab, derpiyên wê yên dirêj bi doxîneke qehîm hatibû şidandin. Ew, hemû bedena wê, hemû xweşî û bedewiya wê li

hêviya destan bû, lê ne doxîn! Gerçî her tişt bi hêdîka, bihust bi  
bihust bi

rê ve diçû, lê fîstanê kambax û doxîna xayîn înad dikirin. Çare nîn  
bû,

177

min rahişt fîstên û min ew çirand. Wê dengê xwe nekir, heye ko  
heta ji

vê yekê hez jî kir, lê gava min destê xwe avêt doxînê û xwest wê jî  
bi destan

jêkim, qirîniyek pê ket,

Koro! Hêdî be law, te kezeba min peritand, korê heram! Ava reş bi  
çavê

te yê sax de jî were, pîsê heram!

Dewsa nifiran aliyê min bike, delala min, min gotê û tiliyên xwe yên  
dirêj û qelew li ser hêtên wê gerandin.

Dewsa ko tu min perçe bikî, weha bibêje, cinawirê çavkor,  
çavbirçiyoyê!..

Hingê her tişt ji nişka ve guherî, ew keça xama, lê bêdeng û masûm  
ko

piraniya caran li koşeyekê, bêyî ko dengê xwe derxe, rûdinişt an jî  
bêdeng

bi şixulên basîd ên malê radibû, qulipî ser, ez çî bibêjim, ser teyrekî  
dirende yan jî ser pilingekî har. Wê ji min re digot cinawir, lê niha  
ew

qulipîbû ser cinawirekê ko bi tevgerên xurt, çapik û zana ez dîl  
girtibûm.

Niha êdî wê her tişt bi rê dixist, mîna şahmaranekê xwe dilivand,  
qumçikên kirasê min ji hev dikirin, doxîna min ko ji bervajiyê ya wê  
gelekî sist bû, vedikir, destê xwe li ser sînga min a tijî pirç digrand.

Şerm

jê bi dûr ketibû, gava wê destê xwe avêt nav heya min, qirîniyeke  
din ko

ji ya berê gelekî cihê bû û tê de ken, kel, best û arzû hebû, pê ket,

Belqityo! Ev singê hanê! Çawan tu dikarî vî nebxêrî di nav şalan de veşêrî?

Min dengê xwe nekir, ma min ê çî bigota? »Biloyê« ko wê ji lîstikên zaroktiyê baş dinasî, bi çerxa felekê û leza salan, qulipîbu ser singekî bêbav. Ez bi tenê keniya û min bêdeng lê nihêrî; şepalê bi şixulê xwe

dizanîbû, ne bi tenê karê malê, lê bi karê ruh û dil jî dizanîbû. Min ruh û

canê xwe ko gihîştibû bilindahiyên çiyayê Cûdiyê û di nav mij û dûmana

bilindahiyên de govend digirt û bedena xwe ko qulipîbû ser kevaneke

vekişiyayî ko di bin tîna tava germ a welatê Babîlê de dibiriqî, heşê min li

ser pilingên har û li ser zimanê min jî çend rêzên Melayê Cizîrî ko ji me

hinekî bi dûr di gora xwe de dinivist, mîna stranekê, bi hêdîka, teslîmî

şepala xwe, teslîmî destên wê yên dirêj û zirav, bedena wê ya narîn kir;

Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir, dil ji min

Awirê heybetpilingê dil ji min bir, dil ji min

Wê şepalê miskîxalê dêmdûrê gerdanşemalê

Cibheta bîskan sema lê, dil ji min bir, dil ji min.

Min dengê kîn û nefretê ko min gelek caran li vir û li wir bihîstibû, di

178

destpêka êrîşa keleha Seîd Begê de, carekê jî, li kitabxana Mam Sefo, ji

nav rûpelên Tewratê bihîst. Xwedayo, ew çî deng bûn ko Xwedayê alemîn ji bo ders û tecruban veguhezandibû me, nifşên nû yên însaniyetê, lê me çu carê jê ders û tecrube wernedigirtin.

Piştî ko min çîroka xwe û heybetpilingê jî gote we, niha em dîsan

dikarin vegerin ser mûsîbetên ko diqewimîn. Mûsîbetên ko axa  
welêt  
qulipandibû ser çola Babîl û Nînovaya xopan, însanên welêt kiribû  
ker û  
lal, derew, fort, dek û dolap kiribû huner, hêvî û best kuştibûn û  
xizîn û  
kederê kiribû nan û av.  
Rewşa Cizîrê, Botanê û hemû welêt, berî çûyina me û piştî hatina  
me,  
yekcar guherî bû. Ew azadî û serbestiya bajêr ko em tê de, bêyî ko  
haya me  
jê hebe, dijiyan, piştî vegera me, têk çûbû. Dewsa azadî û serbestiya  
bajêr,  
çûyin û hatinê, niha pirs, şik, guman, rêgirtin û qedexe hebûn.  
Mifrezeyên  
eskerî yên mîrekiyê ko li bajêr û der û dorên bajêr nedixuyan, niha  
çavnêriya ketin û derketina bajêr dikirin, dengê tivingan ko bi tenê  
di  
nêçîr û seydan de, li zozanên çiyayên bilind, dihate bihîstin, niha di  
meqerên eskerî de ko li der û dorên bajêr û mîrekiyê mîna libên  
tisbîheke  
qetiyayî, roj bi roj bêtir belav dibûn, dihate bihîstin. Ya herî balkêş,  
bêgu-  
man, osmanî bûn, ko heta hingê ewçend bi xurtî hebûna xwe nîşanî  
ehlê  
Cîzîra Botanê nekiribûn. Pêşî mela, seyda û aqilmendên dewletê ko  
bi es-  
lê xwe kurd bûn û qasidê paşayên wîlayetan bûn, li bajêr û li dora  
qesrê  
xuyabûn, paşê karbidestên Babiâlî ko bi rîhên xwe yên palik, kincên  
xwe  
yên alafrangî û fesên xwe yên sor gelekî bala xelkê dikişandin, hatin  
û çûn.

Bi dû wan re jî kumandarên eskerî, eskerên çekdar û mifrezeyên peya û si-war ko ji bo şer û pevçûnan perwerde bûbûn, li mîrekiyê, mîna gizêrên be-jî ko ji nişka ve ji bin axê serî radikin, xuyabûn. Ji vê tevgera geş, herkesî, ne bi tenê min ko ji çavekî bûbûm, herweha korên ko ji herdu çavan jî bûbûn, têdigihîştin ko pergaleke nû ko bêtir eskerî bû û bi fermana ku-mandaran û lûleya tivingê bi rê diket, hêdî hêdî, li welêt dihate pê. Li milê din tevgera Mîr û mîrekiyê jî, ji her carê bêtir xurtir, geştir û firehtir bûbû; mîr û begên mîrekî û bajarên cîran dihatin û diçûn, aqil-mendên Mîr, Mam Sefo jî tê de, hertim civat digerandin, qasid hertim nûçe, xeber û name dibirin û danîn, bazirganan çek û tiving dianîn û li bazaran difrotin, eskerên mîrekiyê di nav şal û şepikên xwe yên rengîn û paqij de di navbera bajar û gundan de diçûn û dihatin. Bi kurtebirî, asimanên welatê Cizîra Botanê girtîbûn, ewr diguriyan, birûsk û baran li rê bû.

179

Herçî em bûn, ez û hevalên min, ez û Migo, piraniya caran li mala wan, li hêviya Mam Sefo û xeberên wî bûn, Heme, tevî koma xwe ya dîndar, çûbû welatê Hekaran, Şemzînanê, nik şêxên Nehriyan û hem ders didan wan hem jî ders û tecrubeyên xwe yên dînî dewlemendtir dikir, Têlî ko

min carina didît, li medresa biçûk a qesrê ders dida şagirtên  
malbatê û  
herçî Yezdînşêr bû, mîna ko bîhna axa avis a baranê bi difnên wî  
ketibe,  
çûbû nik xalê xwe Seîd Begê. Bajar, welat ko bi hatina Mîr re ketibû  
ser  
riyeke din a bextiyarî û serfiraziyê û heyat, tevî xwarin û vexwarin,  
zexîre  
û dewlemendiyê geştir bûbû, tevî me, niha li hêviyê bû ko tiştêkî  
neçê,  
tiştêkî kambax biqewime. Herkesî didît ko aştiya ko Mîr, bi hezaran  
di-  
jwarî û zehmetiyan, di navbera mîr, axa, beg, şêx, dîn, ziman, ehl û  
navçeyên welêt de, bi hostahiyeke bêpayan, anîbû pê, mîna pira ko  
nikaribe xwe li ber pêlên rabûyî rabigire, welê ji binî ve dileqiya.  
Mam Sefo ko êdî çavê kesî lê nediket, carina, di nivê şevan an  
keleber-  
banga sibehan de, westiyayî, çavsorbûyî, bîhteng û zîz, dihate  
malê.  
Hingê me dilezand û em diçûn kitabxanê, warê fikir, şik û gumanan  
û li  
hêviyê disekinîn. Ew pêşî diçû nik xanima xwe ko êdî çu carê ji jûrê  
xwe  
peya nedibû, paşê dihate kitabxanê ko êdî ne bi tenê warê xwendin  
û  
nivisînê, herweha çaxa ew li malê bûya, bûbû warê wî yê xwarin,  
vexwarin, razan û nivînê. Ji ber ko ewî dizanîbû ko em li hêviya wî û  
xe-  
berên nû bûn, wî bi hatinê ve, heke birçîbûya, tiştêkî sivik ko  
hurmeyên  
çapik jê re danîn, dixwar û dipeyvî, heke nebirçîbûya, rasterast  
agahî di-  
dan me. Gotinên wî ko berê, piraniya caran, qala xwendin, nivisîn,

zanîn, huner, edebiyat, ger, geşt, hînbûn û pêşveketinê dikirin, niha,  
mî-

na guherîna rewşa bajêr û welêt, bêtir qala pevçûn, şer, berberî,  
çek û di-

jminahiyê dikirin.

Însên şîrê xaf mêtiye û hezkarê xwe, ezîtî û quweta xwe ye, ewî pirî  
caran digot, qelûna xwe pêdixist, ji ber westa roj û şevan, li ser  
sedirê pal

dida û didomand, însan, nemaze însanên me yê nezan ên navçê ji  
xwe

û ji çek, hêz û quweta xwe hez dikin û tiştê herî xirab, pê bawer  
dikin û ji

ber vê yekê jî dikarin bêperwa her tiştî têk bibin. Heta çilka tirs û  
xofa

têkdanê, dilopa wîcdan û merhemetê nekeve dilê wan, heta ko ew  
fahm

nekin ko xetera herî mezin çekên di destên wan de ye, şixulê me  
hemûyan, di sêrî de jî, şixulê Mîr gelekî zehmet e.

Herçiqasî haya me, min û Migo, ko di wê geremol û heyecanê de hê  
dest bi şixulekî diyar nekiribû, ji rewşê û pêwendiyên hebûya jî, bi  
got-

inên Mam Sefo ko bi carekê ji taqetê ketibû û êdî mîna kalekî  
dixuya,

180

rewş bêtir zelal dibû. Me ji gotinên wî çêtir fahm dikir ko dewleta  
Osmanî ko demekê hukimdarê heft duwêlan, ji welatên Maxribê  
bigire

heta çolên Erebaştanê, ji welatên Qafqasiyayê bigire heta navenda  
Ewrûpayê, hukimdarê nivê cîhanê bû û alaya Osmanî ne bi tenê li  
qi-

raxên çemê Dicle û Firatê, herweha li qiraxên çemê Nîl û Tûnayê hêl  
dibû û keştiyên wê ne bi tenê li qiraxên deryayên Spî, Reş û Egeyê,  
her-

weha li qiraxên Hazer, Hînd, Atlantîkê jî lenger davêtin, mîna ko bi  
zelzeleyekê ketibe, niha ji binê ve dihejiya û ji lewre jî di nav  
tevgereke  
bêhempa de bû, da ko bikaribe xwe xelas bike. Siltanê Osmanî ko  
di eynî  
wextê de xalîfeyê sererz ê hemû qewmên misilmanan bû û di bin  
baskê  
xwe de hem ehlê misilman hem jî nemisilman mîna cihû, file, êzidî,  
pût-  
perest dihewandin, hew dikarîbû bi gotinekê welatan vegirta,  
qewman bi  
rê xista û hukimdariya xwe mîna hukimdariyeke qedîm, qehîm û  
ebedî  
nîşan bida. Gelek paşayên ko welatên dûr ên tixûban ko wîlayetên  
dewle-  
ta Osmanî bûn, serî hildabûn û paşayên mîna paşaye Misirê  
Mihemed  
Elî zora dewletê biribûn. Yewnanistanê, hema çî bigire, azadiya xwe  
li dar  
xistibû, welatên Balkanê mîna Sirbistan, Eflak, Bosna li ser rîya  
azadiyê  
bûn û bayê azadiyê li ber guhê Trablûs, Libnan, Sûriye û Girîdê  
ketibû.  
Ordî ji rewşê ne razî bû, paşayan bi dewletê û bi hev re qayîş  
dikişandin,  
xelkê ko ji eskerî, bertîl, bac û qemçûrê bêzar bû, xwe ji her tiştê ko  
siya  
dewletê lê bû, bi dûr dixist. Ê di ser de dek û dolabên welatên  
Ewrûpayê,  
mîna Englîstan, Frense, Îtalye û Rûsyayê rewşa dewleta Âlî Osmanî  
yek-  
car aloz kiribû. Wan li milekî dil dikirin ko dewlet li ser piya bimîne  
û ji



lewre aliyê wê dikirin, li milekî jî agir dixistin dawa dewletê û piştgiriya

tevgera azadixwazî ya ehlên din dikirin da ko dewlet ji quwetê bikeve û

muhtacî wan be.

Welatê azam ê Osmanî feqîr û bêkeys ketibû, paşa bi îdareyeke kêfî xelkê diperçiqandin û heta derpiyê wan jî mîna bertîl an jî bi navê perû,

alîkarî û bexşîşê, ji wan distandin, ordiyê law û kurên mal û malbatan, bi

navê eskeriyê ko bi qasî umrekî dirêj bû û ji sed kesî not û nehê wan hew

vedigeriyan, ji wan werdigirtin û ew di çolên germ an jî di çiyayên sar de,

bêyî ko di wicdana wan de olanek bê vedan, didan kuştin. Bindestî û bê-

gaviya xelkê bi gotinan nedihate salixdan, ji bo her tiştî, heta ji bo nîskê

ko diçandin û garisê ko radikirin, ji bo pêlavên ko çêdikirin û cil û bergên

ko li xwe dikirin jî bac didan. Ê ne bi tenê bac didan cîhekî, wan bac di-

da padîşêh, dewletê, wîlayetê, paşê, zabî, tahsîldar... herkesî... Li welatê

Osmanî herkes ji hinên din eciz bû, herkesî li hinên din dek û dolap di-

181

gerandin, herkes li pey daf û kemînan bû. Herkes bi hev re, li nik hev di-

jiya, lê bi rik, kîn, berberî û dijminahî. Herkesî hinên din biçûk û nizm didîtin, ordiyê padîşêh, padîşêh wezîran, wezîran paşayan, paşayan mite-

serifan, miteserifan mîr, beg û axan, wan jî ehlê xwe. Û herkesî, ji bo gerandina kar û şixulên heyata xwe, hewl dida ko zordarî li hinên din bike. Herkesî ji hinên din nefret dikir, ji hinên din gef dixwar, hinên din êşandibû û herkes li keysa hilanîna tola xwe bû. Tola ko Mam Sefo digot, kemîna herî xirab a însaniyetê bû. Lê belê tevî ko welatê Âlî Osmanî dileqiya û dikeliya, ewê zext û desthilatiya xwe jî, li der û deverên ko ew pê bawer bû, zêdetir dikir. Hema çî bigire dewletê destê xwe ji welatê Trakya û Balkanê şuştibû û bîr dibir ko welatên Mexrib û çolên Erebestanê jî, ne bi huner û quweta ereban, lê bi dek û dolabên dewletên Ewrûpayî, jê bi dûr diketin. Ji lewre ewê hemû zext û zora xwe dida ser Anatolî û Mezopotamyayê ko piraniya wan misilman bûn. Paşayên herî xwînê û garnîzonên herî xedar li Sîwas, Erzerom, Wan, Diyarbekir, Mêrdîn, Riha, Nisêbîn, Mûsil û Bexdayê bûn. Herçend ax û welatên din ji dest diçûn, axa Anatolî û Mezopotamyayê jî ewçend di bin nîrê paşayên rîhpalik û dilqalik de dinalî. Welatê kurdan ko bi qasî kurdan welatê ermen, asûr, suryan, cihû û êzidiyan bû jî û ji destpêka dewleta Osmanî û vir ve her bi dewletê re bû, di navenda Anatolî û Mezopotamyayê, di navbera herdu çemên tarîxî

Firat û Dîcleyê de bû. Welêt ko her û her di navbera mîr û began de hat-  
ibû parve kirin, xwe perçeyekî welatê Osmanî didît û mîr û begên kur-  
dan ko hertim li dijî hevûdu bûn, li hember hevûdu qayişê dikêşandin û  
yeka hevûdu qebûl nedikirin, hukimdariya dewleta Osmanî qebûl kiribûn û yeka dewletê nedikirin dudo. Tevî ordiya osmaniyan, ew diçûn  
şer û pevçûnan, wan şervan û çekdarên xwe dişandin şerên dûr ên os-  
maniyan ko li ser tixûbên dûr ên welêt diqewimîn û qada şer hertim dibû  
zeviyên mirinê û cendekan, gava lê diqewimî, bi serpereşiyê radibûn û  
sînga xwe ji bo selametiya dewletê û siltanê wê dikirin sîper, bac û hey-  
inên xwe didan dewletê û siltên mîna sultanê xwe yê nemir dizanibûn. Lê  
bi şertekî; ko ew di nava xwe de xweser bûna, padîşêh carina silavên xwe  
yên germ an yadîgareke biçûk a bîranînê binihêrta, dewletê qedir û qîmeta wan bigirta û destê xwe dirêji hebûn û heyinên wan nekira. Lê ev  
şertê hanê ko bi sedan salan di navbera dewletê û mîrekiyan de pey-  
maneke qehîm bû, demên dawîn têk çûbû û paşayên ko dewlet temsîl  
182  
dikirin, ne bala xwe didan vî şertê, ne jî guhê xwe didan îkaz û şîretan û  
êrîş li ser êrîş dibirin ser hebûn û heyinên mîr û began. Heke ez rastiyê

bibêjim, ew hertim di van êrîşên xwe de bi ser diketin, ji lewre di destê wan de çekek ko bihayê wê bêpayan bû, hebû; berberî û dijminahiya navxwe yên mîr, beg, axa û giregirên kurdan. Paşayan simbêlên xwe ba didan, bi ken û fort agir bera wan didan û agir bi welatê wan dixistin, bêyî ko gurzeke pûşê wan jî tê de bişewitiya. Dewleta Osmanî û paşayên wê bi gotina bav û kalên kurdan ko hertim bi tecrubeyên nû yên kirêt dubare dibû, qenc dizanîbûn; berberiyê kurd kuştine, dexesiyê kevan-dine û belaviyê mirandine. Mam Sefo di wan dawiya şevan de ko bi rastî jî bûbûn wextekî tarî yê bêdawîn, bedena wî ya girs ji rûniştinê westiyayî, mejiye wî yê ronî û ser-wext ji pistepist û gotinên pûç sistbûyî, piştî xebardanên me, lê beriya ko ew bikeve xew, heşê wî li ser bûyerên li rê, her digote me, Xortino, divê ev gotina min bibe guhar û bikeve guhê we, ji bîr mekin, kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nîn e. Ev gotin jê re bûbû mîna lorînekê, lê lorîneke jahrîn, tahl. Wî her dig-ot kurmê darê... kurmê darê û dikete xew, lê mîna ko ew bikeve xewa mirinê yan jî bikeve nav xewekê ko bi tenê ji kabûsên dûjehê hatibe pê. Lê belê şevêkê, gava ew hate malê, wî xeberên kirêt ên wê rojê gîhandin

me û li ser sedirê kitabxanê pal da û kete xewê, nav kabûsan, wî îcar ev

gotin negot û dubare nekir. Îcar wî gotineke din a bav û kalan got û dubare kir;

Axîna vî destî ji destê din re namîne... Axîna vî destî ji destê din re namîne... Axîn... Axîn...

Hingê, piştî ko xewê bi tûlên xwe yên reş Mamê ko bi axîn, axînê ji xwe

ve çû, rapêça û bire kûrahiyên tarî yên xewê, min li Migo ko ji ber rewşa

bavê xwe, diya xwe, welatê xwe, bi hêdîka digiriya, nihêrî, çûm nik wî, bi

destê wî girt û ew derxist şaneşînê. Dinya ronî bûbû, stêr çûbûn, tîrêjên

abadîn li pey gopikên çiyayên Cûdî serî hildidan, ava Dîcleyê, mîna ko

haya Dîcleya ko hertim şahida her tiştî bû, ji rewşê hebe, welê narîn, mî-

na ko reşa xwe girêdabe, bêdeng diherikî. Em çûn koşeya herî dûr a

şaneşînê û li wir, li ser kursiyên nizm rûniştin.

Birako, min gote Migo ko rondikên çavên xwe paqij dikirin, birako, rondikan ji bo rojên bê veşêre, ji ber ko rojên bê, rojên qiyametê ne.

Qiyametê dest pê kiriye, Biro, ewî, di nav pêçiyên wî de pel û titûn, bi dengê sext û sist, gote min, ev hesûdî, berberî, dexesî, rewşa dê û

183

bavê min... ev çi ne?

No, Migoyê dilpak, min gotê û ez rabûm ser piya, çûm nik dîwarê şaneşînê ko bi qasî deh, panzdeh bihustan bilind bû, min doxîna xwe

vekir û di ser dîwêr re, min bi qasî çendekê, ber bi çêm, mîza xwe reşand.

No, dîsan min gotê, gava ez vegeyriyam şûna xwe, no birako, ez nizanîm

ka te ferq kir, lê îcar Mam lorîna xwe ya kirêt a kurman, dubare nekîr.

Ewî îcar tiştêkî din got.

Law, kerê çolê, ewî, pêşî, hinekî bihêrs got, tu weha kîr û gunikên xwe

derdixî û mîzê, mîna ko ew ava zemzemê be, ber bi jêr direşînî! Eger hin

te bibîbin, em ê çi bikin? Piştî vê gotinê, gava ewî dît ko ez bersîv nadimê,

hingê wî, niha bi dengêkî maqûltir, bersîva min da, min ferq nekîr ka ba-

vo çi got û cixareyeke pêçayî da min û ya xwe jî bir devê xwe û bi hestê ev

vêxist.

Min ferq kir, Migo, min gotê, heste jê girt, cixara xwe pêxist û jê mizeke

kûr kêşand. Ji nişka ve teyrê min ê tawis kete bîra min û min destê xwe

bire ser teyrê xwe ko di stûyê min de bû û gotina xwe domand, Mamo

îcar bi dengêkî sistir û zîztir, gotina xwe ya xewê, ez bawer im, beyî ko

haya wî jê hebe, guherî û ez vê yekê ne mîna elameta xêrê, ji bervajiyê, mî-

na destpêka rojên qiyametê dibînim. Na, ne ko ez welê dibînim, lê welê

hîs dikim, Migo. Rojên gelekî kirêt li ber me ne...

Belê, wê şevê Mam xebera xirab ko heyameke nû, heyama têkçûn û

windabûnê li ber mîrekiyê vedikir, gîhande me; wê şevê biryar  
hatibû  
standin ko Mîr jî tevî êrîşa Osmaniyan bibûya û ew ê bi hev re  
biçûna ser  
hêzên Seîd Begê ko li hember Osmaniyan rabûbûn.  
Wê şevê, li ber destê spêdê, çaxa Mam Sefo hate mal, ew kelegirî  
bû, jê  
deng dervediket. Rasterast ew çû serşokê, hurmeyên malê jê re av  
germ  
kirin, piştî ko ewî xwe şuşt û bîhna xwe veda, di nav cil û bergên nû  
yên  
ewrûpî de, ew hate kitabxanê. Çavên wî yên gir û germ dixwestin  
bikenin, lê di şûna kenî de keser dixuya. Ew nedipeyivî, qelûn di dêv  
de,  
bi tena serê xwe, rast û çep, li ba dikir û di nav kitabxana mezin de,  
bi  
gavên giran mîna kesekî ko heş jê çûbe û nizanibe ka ew çi dike,  
diçû û  
dihat. Min û Mîgo, ko me xwe dabû kêlekê û bi heyecan li hêviya  
xe-  
berên wî bûn, bédeng lê dinihêrî. Piştî çendekê ewî saeta xwe ya  
zîvîn ji  
bêrîka yêlegê xwe derxist, lê nihêrî, çû û tevî ko dinya hinekî sayî  
bû, de-  
riyê şaneşînê vekir, mîna însanekî ko noqî avê bûye û ji nişka ve  
dîsan  
derketiye ser avê û nefes digire, wî kêliyeke dirêj nefes girt û da,  
paşê hate  
qendîla li ser masê wergirt û çû ber refên kitabên, yek bi yek li wan,  
li piş-  
184  
ta wan, li nav û navnîşanên wan nihêrî. Dawiyê ewî kitabeke qalîn  
û

mezin a çermîn ji refê ko kitabên Keso, Maro û yên din lê bûn,  
wergirt,  
ew hembez kir, sê caran ramûsî û vegeriya ber masê, li ser kursiyê  
masê  
rûnişt û rûpelên kitaba çermîn vekirin. Min û Migo, me herduyan jî  
kitab dinasî, ew, Tewrat bû. Herdu destên Mamo li ser rûpelên  
vekirî yên  
Tewratê, wî serê xwe jê rakir û hêdîka li me nihêrî. Hingê me dît ko  
rondik ko li ber roniyaya qels a çirê mîna libên lûlû dixuyan û diçirûsîn,  
ji  
çavên wî ber bi jêr dibûn.  
Kîn, hêrs, kerb û nefreta ko di vê kitaba miqedes de behs dibe, dîsan  
serî radike, xortino, ewî, bi dengê ko kelegirî bû, gote me. Kîn,  
hêrs,  
kerb û nefreta ko hildiweşîne, dişewitîne, kavi dîke û dikuje...  
Wî dê gotina xwe bidomanda, lê ji bo ko ew li nik me bideng negirî,  
ewî xwe ragirt. Piştî bîskeke, gava ewî agirê qelûna xwe geş kir û jê  
gurzek  
kêşand, li lewheyên dîwaran nihêrî, ewî xeberê gote me,  
Osmanî dê êrîş bibin ser hêzên Seîd Begê, pismamê Mîr û paşayên  
Osmanî, qasidên Padîşêh Mîr jî îkna kirin ko ew û hêzên mîrekiyê  
tev  
êrîşê bibin. Min nikarîbû xortina, min û çend aqilmend, şêwirmend  
û  
kurên Mîr, Têlî û Necîb, me kir-nekir, me nikarîbû rê li ber vê biryarê  
bi-  
girta. Hîç nebe, Mîr diviya bêteref bima, xortina, lê nebû,  
Osmaniyan û  
berdevkên kevneperest ên mîrekiyê ko bi aqilê xwe yê kêma  
aqilmendiya  
Mîr dikin, rê nedan Mîr ko ew bikaribe biryareke din bistîne. Şûr û  
xencerên duban ên xwînî ko ji polayê nêz û bi destê hesinkerên  
hoste



çêbûne û ev çendek e, bi saya serê Mîr, di kalanê xwe de jengîn bûn,  
ni-

ha dîsan ji kalanan tîn kêşandin, dîsan mam û birazî, xal û xwarzî  
radib-

in hev, dîsan daxwaza tolhildanê serî radike. Dîsan gotinên Tewratê  
dubare dibin, dîsan em ê neçar Tewratê dubare bikin.

Mam Sefo weha gotibû û bêyî gotineke din li olana ko di dilê wî de  
ve-

dida, zêde bike, rûpelên Tewratê vekirî hiştin, rabû ser piya, tevî cil  
û

bergên nû ko em tînegihîştin ka çima ewî li xwe kiribûn, li ser sedirê  
dirêj

pal da, lehîfa tenik kêşand ser xwe û bi gotinên nû ko min qalê kirin,  
di

xew re çû.

Çavê min ê kor dîsan dest pê kiribû û diêşiya û min bîr bi gotinên wî  
dibir; gotinên nû, nîşana heyama nû bûn.

Dengê sûzenî û keserê ko li ser rûyê Yezdînşêrê matbûyî dikire qîrîn,  
di

dawiya êrîşa keleha Seîd Begê de, tevî dengê şewat û hilweşînê, bi  
guhê

min ket, – dengê bêdeng, lê ji bo çavekî bîrbir tijî olan, ko ji wê  
rojê û

185

pê ve, ez hertim lê difikirim.

Di navbera bavikên Mîr û Seid Begê de, ji bo hukimdariyê, herwekî  
ko

min qalê kir, hertim berberî hebû, lê wan berberiyên xwe, bêyî ko  
rahêjin

çek û sîlehan, hertim bincil dikirin û hêrs û kerba ko hertim li  
doralîyên

wan bû, bi hunera qedîm a eşîriyê, haş dikirin. Lê îcar rewş yekcar  
guherî

bû, îcar bivê-nevê xwîn ê birijiya. Ji çend salan û vir ve, Seîd Begê ko keleha Dêrgulê mîna meqer bi kar dianî û hukim li deverên Erûx û çiyayên ber bi welatê Hekaran dikir, li hember hukimdariya dewleta Osmanî serî rakiribû û hew gotina wan bi cîh dianî û êdî ne bac dida dewletê, ne jî esker dişand ordiyê. Ev tevgera nû mîna sitriyekî dikete çavê dewleta ko ji Ewrûpa, Balkan û welatê Mixribê vedikêşiya; dewletê pêşketineke weha ne qebûl bû.

Piştî ko Mîr jî gote erê û kete nava refên osmaniyan, mifrezeyên çekdar ên ordiya Osmanî ko bi rêberiya paşayekî bejndirêj, rûtirş û jixwerazî, bi navê Mihemed Paşa, gav bi gav hatin der û dorên Cizîrê jî. Pêşî zabit û berdestên wan, paşê paşa û berdevkên wan û bi dû re jî mifrezeyên çekdar û topên wan hatin. Esker ger peyatî û siwar di riya bejî re, ger bi kelekan, ji Diyarbekirê, bi riya çêm re hatin. Topên ko ga û bergîran dikêşandin, heyecaneke mezin li bajarê ko hema çi bigire hîç carekê jî tiştên weha ecêb nedîtibû, anî pê. Mifrezeyan li ber devê riyan ko di kêleka çêm re dibihurîn û li ber qûntarên çiyayê ko bi qasî çend qonaxan ji bajarê jêr bi dûr bûn, konê xwe vedan, alaya Osmanî daçikandin bilindahiyên û ji berbangan heta hingûran dest bi talîm û termînan kirin.

Cizîrê, axa welatê Botanê ko niha bi pêlavên zabît û eskeran û bi tek-erên topan dihate hinciqandin, bêdeng û keserkûr li bûyeran temaşe

dikir. Deverên şox û şeng ên Dîcleyê ko bi dengê bilûra şivanan û  
awaza  
dengbêjan tijî bû, niha bi dengê tivingan, bi nîda û marşên eskeran;  
axa  
reş û sor a bi bereket ko zeviyên nîsk, genim, garis û ce bû û payîzê  
zer,  
biharê hêşîn dikir, niha bi berikên vala û barûta şewitî ya tiving û  
topan  
tijî bû. Ê ehlê bajêr ko bixizîn, ji her carê bêtir li kar û şixulên xwe  
yên ro-  
jane hûr dibû, da ko bala xwe ji bûyeran bide alî, dizanîbû ko ev  
tevger,  
ev hazirî û lebat li dijî birazî û xwarziyên wan bû.  
Lê hingê, di wan rojên tarî de, me nizanîbû ka me dê çi bikira, li mala  
ko jixwe tê de şîn hebû, yanî li mala Mam Sefo ko yekcar qulipîbû  
ser  
maleke bêdeng û kavil, bi rastî, şîn hate pê. Ji ber bextê me yê neçê,  
heye  
ko yê çê, şevekê, li ber destê sibeheke ronî û zelal, xanima Mam,  
diya  
Migo û Armê, Senemxanê ko ji mêj ve bû, ji hawîrdor xatir xwestibû,  
îcar  
186  
ji dinyayê jî xatir xwest û wefat kir. Senemxanê ko herkes li benda  
wefa-  
ta wê bû, di destpêka heyama nû ya kambax de, berî ko ew jî mîna  
me,  
bikeve ber pêlên xedar ên heyama nû, heye ko bi zanîn, di demeke  
baş de,  
xaça wê li stû, Încîla Nebî Îsa li ser sîngê, di jûreke tarî, lê di bin ron-  
ahiyê qels a qendîlan de, bêdeng, bêxirexir, bêjan, bi rûyekî aram,  
di

xewa şevan de, xweziya min pê, kete xewa ebedî û hemû xem û  
endîşeyên  
dinyê li pey xwe hîştin. Senemxana ko her, bi sebir û metanet, aliyê  
me  
hemûyan, mêrê xwe Mam Sefo ko heşê wî bêrawest li ser  
gerandina kar  
û şixulên mîrekiyê bû û jê re ji mêrekî bêtir hevalekî bû, zarokên  
xwe  
Migo û Arme ko bi delalî û nazdarî mezin bibûn û hertim naz û tîzê  
wan  
hebû, min, Biroyê sêwî ko li mala wê germahiya mal û malbatê  
dîtibû,  
kiribû, dîsan, lê îcar bi wefata xwe, gihîşte aliyê me. Senemxanê  
wesiyet  
kiribû ko Mam, hîç nebe ji bo cara dawîn, ji bo çend rojan, dest ji  
kar û  
şixulên mîrekiyê berde û wê bibe welatê bav û kalên wê û li deverên  
derya  
Wanê wê veşêre. Ev daxwaza Senemxanê ji bo me hemûyan bû  
hêncet ko  
me xwe ji tevger û bûyerên ko dihatin pê, bi dûr xista.  
Tu jî bi me re were, Biro, Mam, di nav cil û bergên reş ên alafrangî  
de,  
êdî rîhberdayî, zik lê werimî, li kitabxanê gote min, tu jî were, ez  
ditirsim  
ko tu li van deran, di van rojên aloz de tişteki bînî serê xwe.  
Mam, mîna Migo û Heme ko hê jî ne diyar bû, rasterast nedigote ko  
ez  
tiredîn bûm, lê ew ji tiredîniya min ditirsiya û dil dikir ko ez jî pê re  
biçû-

1. Bi rêdana Mîr ko tevî ko hewcedariya wî di wan rojan de gelekî  
bi

Mam Sefo hebû, di keleberbanga sibeheke biharê de, berî ko bajar  
hişyar  
be û esker dest bi zirtezirtê bikin, li ser hespan, bi komeke bi qasî  
bîst ke-  
san, Migo û Arma reben ko yekcar ji xwe ve çûbû, bedena wê ya jar  
çilmisîbû û ji her carê bêtir hewcedarî germahî û şefqeta min bû, jî  
tê de,  
Mam Sefo ko îcar şal û şepikên fireh û belek ên welatê Mikusê li  
xwe  
kiribûn li pêş, ez, keya, çar egîdên çekdar ên botî ko bi nîşangeriya  
xwe  
nas bûn û lûlikên tivingên wan ên zîvhêlî li ber tîrêjên tavê dibiriqîn  
jî li  
doraliyên wî, Senemxana ko xweşik hatibû şuştin û dermankirin, di  
nav  
tabûteke gûzîn a dermankirî de diniviya, di nav erebeyeke girtî ya  
dêra er-  
men a Botanê de, li pey me, em bi rê ketin. Çûyina me bû geşteke  
dînî ya  
ermenan û li her cîh û gundê ko em tê re yan di kêlekê re dibihurîn  
û tê  
de ermen hebûn, dihatin nik kerwanê me yê biçûk, diçûn ser  
Senemxanê  
ko keça keşeyekî navdar ê hemû cemaeta ermenan bû, mîna ko ew  
li do-  
ra Meryem Xanê, dayika Îsa Mesîh bicivin, welê bi rêz û rêzdarî, li  
dorê  
diciviyan, destê xwe dibirin eniya xwe, xaç derdixistin û bi zimanê  
xwe ji

187

Încîlê hedîs, nemaze hedîsa Hayr Mer dixwendin.

Piştî rêwîtiyeke dirêj a bi qasî hefteyekê-deh rojan, em gihîştine  
Wanê,

bajarê ko ji hezaran salan û vir ve, hertim paytextiya hebûna ermenan kiribû. Bajêr û hawîrdorên bajêr bihîstibû ko keça wan vedigeriya axa bav û kalan û wan haziriyeke mezin li dar xistibûn. Di danê êvareke hinekî hûnik de, ehlê bajêr, ne bi tenê ermen, tevî keşe û giregirên dêra ermenan, herweha kurd, tirk û cihû jî, tevî rêber û giregirên xwe, hatin pêşiya me û bêyî ko rawestin, wan em hildan û bi keşiyên biçûk ên Derya Wanê, em çûn girava biçûk a Axtamarê ko yek ji warên herî miqedes ên dinya file û ermenan bû. Ewana li wir, li kêleka dêra kevnare ko li ser girekî, ji kevirên reş û spî ava bûbû û mîna nikilê bazekî dixuya, ji bo Senemxanê, gorek vekolabûn. Mîna ko paşê hate serê min jî, Senemxan, piştî umrekî, dîsan vegeriyabû warê nas, warê ko însan bi hizûr serê xwe datîne ser axa wî ya reş. Piştî ko me Senemxan, bi hedîsên ermenî û bi gotinên ermenî mîna »hayr-vortî-hokîn-surp atsvaz« ko însan dikare bibêje, ew mîna bismilla-ha misilmanan bû, veşart, em vegeriyayan Wanê û li wir man, lê belê heşê min her li ser welatê Cîzîra Botanê û bûyerên wê bûn. Çi diqewimî? Wan topan dest bi teqînê kiribûn, heke kiribin, dengê wan çawan bû? Tevî ko Mam, Migo û Armê bi israr xwestin rê li çûyina min bigirin, dawiya dawîn, piştî çend heftan, ez hew hewiyam, ruhê min ê dîn îsyar kir û di

êvareke zelal a heyveronê de ko heyv qulipîbû ser siniyeke zîvîn a  
mezin  
û gulover û dinya di nava ronahiyeke helesor de hiştibû, min ew û  
kesên  
din li cîh hiştin, yek bi yek ji wan xatir xwest û dîsan li hespê xwe yê  
ki-  
hêl ê belek siwar bûm, mecîdeyên min ko Mam Sefo dabûn min di  
bêrî-  
ka min, teyrê min ê tawis di stûyê min û xencera min a zîvhêlî di  
pişta  
min de, min berê xwe da Cizîra Botana xopan.  
Çaxê ez di rojeke gelekî germ de, piştî nîvroyan, gihîştim deverên  
Cîzîrê, tiştê yekemîn ko bala min kêşand, bêdengî bû; ne meqerên  
eskerî  
li hawîrdorên bajar mabûn, ne jî topên wan, ne şivan û gavan  
dixuyan ne  
jî kerî û garanên wan ko hertim li dora bajêr diçêriyan. Bihar diqulipî  
ser  
havînê, tîrêjên tavê û tîneke boş hawîrdor dikizirand û zevî û giyan  
ko ki-  
rasê xwe yê biharê ji xwe kiribûn, zer dikirin. Tavê zora darên çilo,  
spîn-  
dar, çinar û tûyê ko geh li vir, geh li wir, lê her li qiraxên çem mîna  
neqşên  
xalîçeyeke rengîn dixuyan, biribû û dar sist bûbûn, pelan stû xwar  
kiribû.  
Ji bilî çend qijikên tiral ko bi dengê xwe yê bed bêdengiya hawîrdor  
xira  
dikirin, çu teyr li asimên nedixuyan. Heye ko ji min re welê dihat, lê  
her  
188  
tişt, sist, sext û bêdeng bû, bêguman heke ez gulberojkên balbilind  
ko

xelkê çandibûn û bi maxrûrî û xurtî xwe dabûn ber tavê,  
nehesibînîm. Li  
taxên derveyî bajêr jî jin, zarok û pîrejinên ko li ber deriyan, li hewş  
û  
kuçeyan dixuyan, bi gavên bitevdîr tevgera xwe girêdidan, bêyî ko  
ew  
bixwazin balê bikêşînin ser xwe, bitevdîr li ber çavan winda dibûn.  
Bêdengiyê perda xwe rakêşandibû ser bajarê qedîm ko bi hezaran  
salan  
her û her warê dangan bû.  
Li bajêr ez hîn bûm ko hêzên osmaniyan, bi alîkariya hêzên Mîr û  
hin  
begên din ên kurd ko ji kavilkirina gundên Seîd Begê bigire heta  
vegirti-  
na rê, qonax û şikeftan da ko hêzên Seîd Begê nîkaribin herin û  
werin, bi  
hemû şixulên berdestiyê rabûbûn, zora Seîd Begê biribûn û ewî, tevî  
mal-  
bat û kumandarên wî, ji keleha Dêrgulê, bi saxî, derxistibûn. Lê tevî  
ko  
êdî ehlê li dora Mîr vedigeriyan bajêr, Mîr hê konê xwe ko li qada  
şer hat-  
ibû vegirtin, ranekiribû û venegeriyabû. Roj, ne roja rawest û  
bîhnvedanê  
bû, tafilê min hespê xwe yê dilsoz ko ji riyêke dûr, li serê jî kesekî  
mîna  
min ko bi qasî topeke osmaniyan giran bû, dihat û gelekî westiyayî  
bû, li  
axura Mam Sefo guhert, heqîbên xwe danîn malê û hespekî zînde û  
çîkî  
boz ko seyisan ji tawlê derxistibûn, zengo kir, bêyî ko ez herim nik  
hey-



betpilinga xwe ko ji ber xirecirên qewimî, min çendeke dirêj  
nedîtibû,  
min ber bi keleha Dêrgulê da rê. Danê êvarê bû, tava ko dinya bi  
agirê  
dûjehê qelandibû, hedî hêdî, li pey zeviyên boş ên deştê diçû ava.  
Li rê ez  
pêrgî gelek kesên ko ji seferê vedigeriyan û gelekî westiyayî  
dixuyan, ha-  
tim. Sefer bi serfirazî kuta bûbû, lê kesên ko ji seferê dihatin,  
mizafer  
nedixuyan û çu tişt nedigotin. Bi tenê ev gotin ji devê wan derdiket;  
Dêrgul dişewite.  
Min hespê xwe rakir çargaviyê û dewsa ko ez ber bi gundê ko Mîr  
konê  
xwe li kêlekê vedabû, min xwe da ser riya kelehê. Hingê, gava xelk  
ji wir,  
bêyî ko li paş xwe binihêre, gavegav, vedigeriya û ez ber bi kelehê  
diçûm,  
Tewrat û ew rûpela ko Mam vekiribû kete bîra min. Heke bê bîra  
we,  
min ji we re behsa wê berbanga kirêt ko Mam xebera vegirtina  
keleha  
Seîd Begê gîhandibû me, kiribû, berbanga ko Mam rûpelên Tewratê  
vekiribû û paşê di xew re çûbû. Dotira rojê, çaxê Mam dîsan çû nik  
Mîr,  
ez vegeriyam kitabxanê nik masê û min li rûpela vekirî nihêrt. Bêyî  
ko  
Mam pê bizanibe, ewî rûpelek vekiribû ko tê de sûretekî mezin ê  
neqîşandî hebû. Di sûret de zilamekî û sê jin hebûn, zilam û du jin li  
çoleke beyar dimeşiyên û li pey wan jî bajarekî fireh dişewitî. Herçî  
jina  
sisiyan bû, ew, hinekî ji wan dût, rûyê wê ber bi bajarê ko jê dûman  
189

radibû, rawestabû. Ew, Lût, jina wî û herdu keçên wî bûn ko bi ser  
daxwaza Xwedayê alemîn, berî ko bajar bi barana agir û xweliyê  
bişewite,  
dev ji bajarê Sodomê berdabûn û ber bi devereke din diçûn. Lê li rê,  
tevî  
ko ji wan re hatibû gotin ko ew ê neziviriyana û li bajarê şewitî  
nenihêrti-  
na, xanima Lût serê xwe zivirandibû, li bajêr nihêrbû û di cîh de  
bûbû  
kevir.  
Niha jî ez, bi meraqa xanima Lût, ber bi keleha şewitî ko herkes, bêyî  
ko bizivirin û lê binihêrin, jê direviya, diçûm, lê min nizanîbû ka ez  
gunehkar bûm an ew. Berî ko ez bigihêm kelehê, dengê topên  
osmaniyan  
xebera agir û şewatê gîhandine min. Min dengê welê toq, tijî xof  
û saw,  
di hemû heyata xwe de, çu carê nebihîstibû. Tevî ko deng ji dûr  
dihat,  
ewî bi olana xwe hemû hawîrdor vedigirt û her çi zindî bû, teyr û  
rawir jî  
tê de, ditirsand. Ê çaxa keleh li ber çavê min xuyabû, ez li ser hespê  
xwe  
veciniqîm; keleha ko li ser bilindahiyên herî jor ên zinaran ava bûbû  
û  
mîna hêlîneke teyrên êlo dixuya, bi rastî jî dişewitî û gulokên gur ên  
agir  
ber bi asiman bilind dibûn. Ro çûbu ava, êvara ronî daketibû û di  
êvarê  
de ronahiya agirê keleha Dêrgulê hawîrdor qulipandibû ser  
berbangê.  
Osmaniyan topên ko bi tenê bi hesp û bergîran dikarîbûn bîn  
kêşandin,

hilkişandibûn jor, herdu milên bilindahiyên zinaran û ji wir keleh  
gule-  
baran dikirin. (Paşê min bihîst ko kurdan ew top hilkişandibûn jor.)  
Mîr û begên kurdan ko çu carê nikarin bi bayebilindiyeke mezin, mî-  
na dewlet û hukimdariyê rabin, qîma xwe hertim bi hin payebilin-  
dahiyên biçûk tînin. Seyd û nêçîrên gumreh, dengbêjekî ko hem  
dengê  
wan hem jî denge tarîxa wan e, mêvanperwerî, dawet û dîlanên ko  
li ser  
zimanan e, ji bo wan payebilindî ye. Herweha keleheke asê, qehîm  
û  
maxrûr ko di bilindahiyên herî asê yên zinar û çiyân de ava bûye û  
li  
milekî tirsekê dide ehlê navçê û li milekî jî xurtî û esaletekê nîşan  
dide.  
Keleha Dêrgulê ko esalet û payebilindiya Seîd Begê bû, niha bi  
topên os-  
manîyan dihate hilweşandin û jê agir û dûman digihîşte heft qatê  
asi-  
manan. Bêguman bi alîkarî û rêdana mîr û begên din ên kurdan ko  
hê  
nizanîbûn ko ew top ê rojekê di zikê kelehên wan de jî biteqiya.  
Topan  
kevir li ser kevirê Dêrgulê nedihîştin, bêguman li ser daxwaza Mîr jî,  
ko  
ne ewî, ne jî me, hê nizanîbû ko lilûyên wan topan ê rojekê  
biziviriyana  
ser payebilindahiya Mîr, keleha Ewrexê jî.  
Dêrgul dişewitî, lê gelek kesên ko di kelehê de bûn, xwe spartibûn  
çiyân, der û dorên şikeftên ko di eynî wextê de hêlînên teyrên  
dirende  
bûn. Ez ê, heke Yezdane Dilovan taqetê bide min, di şevbuhêrken  
me

190

yen bê de, bi dirêjî behs lê bikim, lê belê, min dil heye, niha, bi tenê hewqasî ji we re bibêjim, ko çaxa ez pergî çend kesên ko ji kelehê re-

viyabûn, hatim û ewana ez nasîm, tafilê wan ez hildam û em, peyatî, çûn

ser zinarê herî bilind ê hemû navçê, nik hevale min Yezdînşêr, xwarziyê

Seîd Begê ko êdî dîl ketibû û li ser riya welatê xerîbiyê bû. Yezdînşêrê ko

bûbû peyayekî gelekî çeleng ê bejndirêj, pozberan û simbêlqeytan ko li

ser beden û rûyê wî çu eybên mîna eybên beden û rûyê min û Mîgo nedixuyan, li wir ko hemû navçe mîna bergehê jê dixuya, li ber devê

şikeftê, li ser kevirekî rûniştibû û li keleha ko jê agir radibû û bi bayê

êvarê ko nû dest pê kiribû, mîna cinawirekî xwe li ba fikir, dinihêrî. Çavê

wî bi min ket, lê ewî ne xwe livand, ne jî rabû ser piyan û ne jî tevgereke

din anî pê. Awirê rûye wî çî bû, min jê dernexist, lê çavê wî her li ser gu-

lokên êgir bû. Bêdengiyê zîz li dar bû, ez bi hedîka çûm nik wî, kesên

li doralî ko mîna wî bêdeng bûn, cîh vekirin, ez li kevirê kêleka wî rûniş-

tim, mîna wî min jî çogên xwe kêşandin ber sînga xwe û li jêr, li keleha

ko hew payebilindî bû û êdî dê di çîrok û rîwayetan de bima, nihêrî. Lê

hîç ji bîra min naçe, hingê ew bêdengiya Yezdînşêr ko min jî baş nas

dikir, agir bi ruhê min xist. Dîsan çavê min ê kor êşiya, disan dile min  
bû  
bi leyan.  
Dengê bêdengiyê, guhdarên min ên bisebir ko niha hûn ê hew  
gotina  
min bibihîsin, dengê bêdengiyê bi tenê ji aliyê kesên ko bi taya  
dengê bê-  
dengiyê ketine, dikare were bihîstin. Niha, bi qesta cixare pêçan û  
avrê-  
janê, bi hênceta av, mewîj û bîhnvedanê, ez ê jî biçim, gelî  
guhbaran,  
biçim û bikevim nava pêlên dengê bêdengiyê. Piştî deng, pêjn, qîrîn,  
qîjîn, girîn, nalîn, xirexir, xirecir û teşqeleyan, rastiya heyatê,  
bêdengî ye;  
bêdengiya mirinê ko jê xelasî nîn e û bêdengiya ko bi haletên mirin  
û  
kuştinê hatiye pê û hew dikare ji kesekî din re bê gotin. Bêdengî  
mîna  
sêbera însên e, carina li pey însên, carina li pêş, hertim bi însên re  
ye û  
çaxa însan dikeve nava kûrahiyên bêdengiya mirinê, ew jî pê re  
winda  
dibe.  
Heye ko bêdengî carina ji însên bi dûr dikeve, heye ko însan carina  
ewê  
ji bîr dike, lê bi minasebeta hal û hewalekî însanî, ger kêf û henek,  
ger  
xizîn û keser, dîsan ew xwe bi bîr tîne û bêdeng diqîre; ez li vir im,  
ez li vir  
im...  
Niha, piştî ko min hewl da ko ez bêdengiya sar a ruhê sotî yê  
Yezdînşêr

ji dewr û dewranên borî hilînim û bînim, bigihînim we û gewriya  
min a

191

ji gotinê zuha niha bi taseke av dîsan şil, bi çend lib mewîj devê min  
tijî,

di nav bayê bêdengiyê de, ez li fira hehecîkan difikirim. Fikir, heş,  
xeyal

û xewn min hildidin û dibin nik hehecîkên reş û spî yên dûvçetel  
ko her

bihar dihatin nik me, gundên me yên hêşîn û avî. Hehecîkên ko ji  
we-

latên germ ên çolê, ji axeke şewitî, ji devereke windabûyî dihatin  
welatê

çiya û zozanan.

Hehecîk, banê axuran, darên tûyê, darên hejîran.

Pîrejinên ko bi misînan ava hehecîkan dixistin kortalên  
keviran.

Hehecîk, zozanên bilind ên hûnik, dar û deviyên hertim hêşîn.

Xan û kerwansarayên hewşfireh, kemerxwar.

Co, gol, kahnî û bîrên kûr.

Û çem, çemê Dîcleyê ko danê sibehan û danê êvaran tîrêjên zer  
ên tavê lê didan.

Û hehecîkên ko xwe noqî ava wê dikirin.

Hehecîk û dengê wan, vîçevîç, vîçevîç, vîçevîç

Dengê ko mûcîzeyekê tîne bîra însên.

Bajarên kavi ko bi perdeyên wextê,

Bi perdeyên xwelî û herî winda bûne

Tê de ne nebat, ne heyat mane.

Û ew, dengê wê, li ser girên ko li ser bajarên windabûyî hatine pê,

Û vîçevîça wan.

Keleheke şewitî û kavi ko di qelîşekên dîwarên wê de

Êdî mar, dûpişk, marîjok û gumgomok çiv didin.

Li maleke hilweşiyayî ko di eywanên wê de

Giya bejn avêtiye.  
Di navbera kevirên bîra miçiqî ya hewşê de  
Kulîlkên rengîn hêşîn hatine.  
Û ew, dengê wê, vîçevîça wê.  
Dayiyek û zarokek.  
Ku li pey hemû dengên ko bi darbeya şûrê hatine birîn.  
Dengê wan, mûcîzeyaya ko hatiye pê.  
Dayik û zarok, di hembeza hevûdu de, li ser hev.  
Kadîn. Bîhna ka û pûşî. Bîhna xwînê.  
Pêşî deng, nalîn, axîn.

192

Paşê çav, nêrîn.  
Birû, mijang, Bîbik. Di nav xwînê de.  
Birîn, xwîn, êş.  
Destê dê li ser rûyê zarok. Xwîn, bi tenê xwîn.  
Dest xwînê paqij dike. Lê dîsan xwîn.  
Lê deng jî, girîna zarok, axîna lêwik.  
Heyat, li pey her tiştî dîsan heyat.  
Darbeya şûr, mirin, xwîn û li heyatê veger.  
Tevî xwînê, çav vedibe. Carek, du caran.  
Perdeyeke reş, lê çilkeke ronahî,  
Ku di navbera reşahiyê re dixuyê.  
Reşahî, ronahî. Reşahî, ronahî,  
Mîna kelekeke li ser pêlên avê,  
Carekê ber bi reşahiyê, carekê ber bi ronahiyê.  
Lê hembêz, hembêza dayik a germ, a nerm, a boş.  
Hembêza şil ko jê xwîn diherike.  
Nefes, hilm, germahiya dayikekê.  
Tevger, pêşî dest, paşê mil, pî, ling, hemû beden.  
Bi hedîka, bi tevdîr.  
Tevger, carek, du caran...  
Kadîn, ka, axur, bêdengiya boş.  
Ne dengê pez, ne dengê însan.

Tevger, di erdê re, di ser ka û pûşê re.  
Ber bi ronahiyê, ber bi deriyê vekirî.  
Li ber derî, li erdê, li ser piştê.  
Dayik û zarok, di hembêza hev de,  
Di nav xwînê de.  
Ronahî, tîrêjên germ ên tavê.  
Bîhn. Bîhna axê, giya, çîçek, rihan.  
Dar û ber. Bayekî sivik,  
Li hawîrdor, di nav çiqil û perên daran de.  
Li ser rûye qelişî, jêbûyî.  
Tîrêjên sor li ser rûyê ko bi xwînê sor.  
Asiman. Çîkî şîn. Tê de xêzên spî, mîna gulokên hirî  
Rojeke nû, ronahiyeke nû, nefeseke nû.

193

Lê ne deng, ne hes, ne pêjn.  
Ne zar û zêç, ne jin û pîrejin, ne mêr û kalemêr.  
Ne dîk û mirîşk, ne berx û mî  
Hingê ew. Bi tena serê xwe, di ser daran re.  
Ber bi kahniya gund, ber bi avê.  
Xerîb, koçber, mêvan.  
Biçûk, nazenîn, narîn.  
Reş û spî. Dûvçetel.  
Lê ew, dengê wê. Vîçevîç, vîçevîç, vîçevîç.  
Hehecîk. Mûcize.  
Hingê dengê hehecîkê, dengê heyatê...  
Dengê dengbêjên ko hertim dengê methiye û pesnan e, hema çi  
bigire  
hertim bi şox û şeng e. Ne agir û tofan xema wan e, ne jî hilweşîn û  
felaket,  
ne derd û keserên însên, ne jî bêçaretî û bêgaviya xelkê ketî.  
Dengbêjên  
methiye û pesnan, dengê xwediyê xwe ne. Dîn û îmana xwediyên,  
dîn û



îmana wan, gotin, kirin û qewlê xwediyan, yên wan e. Mîna heyva  
ko li  
dora dinyê, dinya ko li dora tavê dizivire, ew jî hertim di nav lingên  
xwediyan de çerx dibin. Wîcdan û merhemeta gotina wan bi qasî  
wîcdan  
û merhemata şûrê xwediyan e, heke şûr di kalanan de ye, dengê  
wan nerm  
e, heke şûr ji kalan kêşandiye, dengê wan jî mîna şûr tûj e.  
Heke hûn meraq dikin ka ez çima, piştî bîhnvedana me, van tiştan  
dibejim, divê ez bibêjim we ko ne bi tenê Seîd Beg, mal û xismên wî  
û  
keleha wî kete ber agirê osmaniyan, herweha dengbejên wî jî.  
Dengbêjên  
ketî û şikestiyên nîn in, heke hebin jî dengê wan nayê bihîstin. Ji ber  
ko  
çu kes naxwaze dengê ketî û şikestiyên bibihîse û li dengbejên wan  
guh-  
darî bike. Çîroka ko ketî û şikestî dibêjin, çîroka ketin û şikestinê ye  
ko  
bazara wê zahf kesat e. Ketin û şikestin pirî caran pêşî bêhêvîtiyek  
û paşê  
jî tirs û xofeke nediyar tîne pê ko ne bi tenê tevgerên civatekê,  
herweha  
ruhê kesên civatê jî vedigire. Qîrîn tîn fetisandin, girîn rondikên  
xwe  
winda dikin, pirs tîn veşartin, bedenên westiyayî sist dibin, derî bi  
hêdî-  
ka vedibin, însan bi endîşe tevgera xwe girêdidin û stêr bêdeng  
dirijên. Ez  
ji tecrubeyan dizanim; însan naxwazin bitirsin, naxwazin ketin û  
şikestinê bi bîr bînin, naxwazin heyata wan di nav tora xofê de  
bixeniqe.

Tiştê bû, mekeve dû, bav û kalan gotiye da ko bîne bîra însên ko her tiştê

qewimî ko tê de jan, keser, neheqî û bêbavî heye, li pey bimîne û bal û rû

194

ne ber bi milê paş, lê ber bi milê pêş be. Ronahî ne li pey, lê li pêş e, her-

weha hêvî, serfirazî, bextiyarî û heyateke mesûd. Û xewn û xeyal ko însan

çu carê bêyî wan nabe. Bi gotinekê, ez dikarim bibêjim, însan weha di-

fikirin; tu dê ji bîr bikî da ko xewn û xeyalên xwe bi ser xî.

Ji lewre, ez bibêjim we, dengbêjên methiye û pesnan ko bi şox û şeng,

qala xwedyên xwe û heyatên wan ên mêrane, serpêhatiyên wan ên egîd,

fikir û gumanên wan ên bêpayan dikin, ne dengbêjên bibîranînê, ji bervajiyê, dengbêjên jibirkirinê ne. Belê, Seîd Beg ko tevî bi qasî du sed

însanên xwe, xwe spartibû kelehê, mal û malbata wî jî pê re, di navbera

hezên çekdar ên osmaniyan de, şikestî, stûxwar, berê xwe da welatê

xerîbiyê û çû. Bi dû çûyina wî re, wirde wirde, hem Seîd Beg, şewata keleha wî û çûyina wî, hem jî gundên ko hatibûn şewitandin, însanên ko

hatibûn kuştin, ji bîr bû, heyat dîsan vegeriya ser qewlê xwe yê berê ko

pirî caran bûyeren bûrî, ketin û şikestin tê de naxuyin. Dîsan ehlê Botanê

di keleberbangên sibehan de hatin bajêr, kerwan ji bajêr veqetiyen, bayê

spêdê yê hûnik di ser çiyayan re pişta dar û deviyar şeh kir, mîna  
her carê  
tîrêjên ko li pey çiyayê Cûdî serî hilda, li ser ava çê m ko her û her  
diherikî,  
leylan da, jinan li pey deriyar li mêrên xwe nifir kirin, pîrejînan li  
hewş û  
eywanan, ji bo neviyên xwe dua xwendin û dengbêjên ko dengê  
wan di-  
hate bihîstin, strana xurtî û mêrxasiyê gotin.  
Wext ko mîna deryayê, ji pêlan tê pê, weha ye; pêlek dere, yeke nû  
tê.  
Pêl radibe, xurt dibe, baskên xwe tijî av dike, digihê qata herî bilind  
û ji  
nişka ve ber bi jêr dibe û hêdî hêdî li qiraxên avê wînda dibe. Lê çaxa  
ew  
wînda dibe, yeke nû bilind dibe. Pêl tîn, pêl derin, guhdarno, lê  
pirsa  
min eve ye; ka kîjan dengbêj dikare dengê pêlan bi guhdaran  
bigihîne?  
Dengbêjên methiye û pesnan ko dengê wan hertim bilind e û tê  
bihîstin?  
Dengbêjên ko di dengê wan de sûzenî, sextî û endîşe heye û dengên  
jibîr-  
bûyî digihînin guhdaran?  
Di ser hilweşîna keleha Seîd Begê û kavilkirina navçê re bi qasî du  
salan  
derbas bûbû û însan, bi pirsên nû, endîşe û hêviyên nû, di nav  
tevgerên  
nû de bûn. Mîrekiya ko xelkê bawer dikir ko wê dê quweta xwe  
wînda  
bikira, ji bervajiyê, hêz û quweta xwe bêtir kiribû û tixûbên xwe  
gîhandibûn deverên dûr ko bi çarmedorî digihîştin Mûsil, Şingal,  
Riha,

Siwêreg, Wêranşar, Diyarbekir, Wan, Mikus, Şino, Wirmiyê, Seblax,  
Rewandiz, Hekar û Sêrtê. Mîrê ko hevalbendê padîşahê Osmanî bû  
û bi

şixulên Padîşêh ên şer û êrîşan radibû, di eynî wextê de  
pêwendiyêke xurt

bi Şahê Îranê re jî danîbû û li milekî din jî bi beg, axa, şêx û mîrên  
din ên

195

kurdan re jî xweş dikir û hukimdariya xwe geh bi gotina şêrîn, geh  
bi şûrê

tûj li ser wan jî ferz dikir. Ewî aştiyek ko bi tayekî xav hatibû dirûn,  
anîbû

pê û malbata Seîd Begê jî tê de, bi mal û malbatên jênexweş re jî  
pêwendiyek ava kiribû. Ya herî balkêş jî, ewî Yezdînşêr ko biraziyê  
wî di-

hat, îkna kiribû ko Yezdînşêr jî bibe şêwirmendê wî û hertim pê re  
be.

Bazarên bajêr û yên Cizîra Botanê zêde bûbûn, bazirganî bi pêş  
ketibû,

kerwanên bêhejmar dihatin û diçûn, xwarin û vexwarin geş bûbû û  
halê

xelkê jî, ji her carê bêtir, xweş bûbû. Çaxa hal û wextê xelkê li cîh  
be, bûy-

er hîn zûtir ji bîr dibin û herwekî ko tê gotin, kes xwe nade ber  
dîwarê

ketî, lê herkes xwe dide ber dîwarê qehîm û kes êdî li tofana li rê  
nafikire.

Herçî ez bûm, ji bilî mala Mam Sefo, min ji xwe re stariyek peyda  
kiribû; mala Apê Xelef. Apê Xelef, ew kalemêrê yezidî yê şên û  
zarşêrîn ko

ez xwedî kiribûm û riya umrê min dabû ber min, li doralîyên Tiyarê,  
di

nav zinarên asê û zincîra çîyan de, kulavê wî lehîfa wî, kumê wî  
bahlîfa  
wî, bilûra wî li hembêza wî, di bin xalîçeya stêran de, li teniştâ  
şivanên ko  
li ber destê wî mezin bûbûn, serê xwe danîbû û çavê xwe girtibû.  
Ma şî-  
vanekî ko umrekî, mîna gotinên xwe, sade, lê bi gotin û serpêhatî  
gelekî  
dewlemend bihurandibû, dikarîbû ji mirineke weha ko di dilê  
tebiyetê  
de dihate pê, çêtir mirin bidîta? Heme ko êdî bûbû alîmekî navdar  
ê dînê  
îslamê û nav û dengê wî roj bi roj bêtir belav dibû, vegeyriyabû Cîzîrê  
û  
qesreke biçûk ko bi kevirên reş ên Cûdiyê lêbûbû, ji cihûyekî botî ko  
koçî  
welatê Filistînanê kiribû, kirîbû û tevî du jin û sê zarokên xwe li wir bi  
cîh  
bûbû. Heme ko li gora gotinan bi mildana şêxên neqşîbendî yên  
welatê  
Hekar û Şemdînanê, ji nişka ve bûbû dewlemend û xwedî pez,  
dewar,  
mal û milk, du jin, yek ji şêxên Medresa welatê Xerzan, yek jî xweha  
hevalê wî Kemaleddîn ko bi me re hatibû gera me ya Mûsil, Bexda û  
Babilê, lê li rê vegeyriyabû, kiribû û ji niha ve bûbû xwediyê sê  
zarokan. Lê  
belê, çaxê me, piştî çend salan, cara yekemîn hevûdu li şîna Apê  
Xelef dît  
û em çûn rûyê hev, ewî, tevî ko şîna û tahziye bû, bi payebilindî, gote  
min  
ko wî dil hebû çar jinan bike û bi qasî bîst zarokan çêke. Heme ko  
mîna

berê jar û zirav bû, xweha xwe Gulîzerê ko bi pitepita xwe ya ji bo zewacê

guhê min biribû, lê her gava ko keys li min dihat, min memikên wê mî-

na ko ez porteqalekê bimêjim, dixiste devê xwe, biribû ba xwe, mala xwe

ya mezin. Mala stûxwar ko xwediye xwe winda kiribû û ez tê de, bi bîh-

na genî ya tir û fisên Heme mezin bûbûm, ji min re mabû û êdî bûbû mala min. Ma Heme ko navê xwe kiribû Hemeyê Malmîran û bi hemû

şixulên madî û manewî radibû, dê mala neçar ko ji hev diket, çi bikira?

196

Mam Sefo ko piştî wefata Senemxanê yekcar ketibû û guherîbû, tevî ko

ew ji gelek tiştan nerazî bû, dîsan vegeriyabû ser karê xwe û hema çi bi-

gire hemû wextê xwe li teniştî Mîr û li kitabxanê derbas dikir. Ewî şix-

ulên xwe yê pere, mal, milk û bazirganî êdî teslîmî Migo kiribû û bala

wî ji mal û milkên dinyayê bêtir li ser kitab, xwendin û gotinên ko di nav

rûpelên kitabî de, mîna wî bêdeng, dinivistin, bû. Ez jî, em dikarin bibêjin, bûbûm keyayê Migo û bêyî ko ji hal û hewalê malê dinyayê tiştêkî fahm bikim, hertim pê re bûm û çaxa hesab, hatin û çûyinê bîhn

li Migo diçikand, min jê re çend stranên Apê Xelefê rehmetî ko qala bêrî-

vanên bedenşox û memikgewher dikirin, digotin.

Min mala xirbe hinekî da hev, li ber derî, ew du sê darên bilind ên çamê

ko xênî dalde dikirin, birîn, mîna şaneşîna kitabxanê, ji kevirê reş û  
textê  
spîndaran şaneşîneke fireh ko dirêjî çêm dikir, da çêkirin, axura  
teniştê  
ko êdî bi kêrî tiştêkî nedihat, bi paqijiyê serast, qulipand ser  
mêvanx-  
aneyekê û çî bilûr, tembûr, saz, erbane û alavên din ên gotin û  
lêxistinê  
yên min û yê Apê Xelef hebûn, hemû xistinê, mezelê min û Heme  
jî  
kire mezelê razanê, bi kerpîçan bilindahiyek ko bi eywanên malên  
Mûsilê  
dişibiyên, da çêkirin û çûlê xwe yê hûnandî yê rengîn û doşega xwe  
ya hirî  
li serê raxist. Cîhê razanê girîng bû, ji ber ko ez piraniya caran ji bo  
xewn,  
xeyal û çêkirina stran û şîîran diketime nav nivînan. Nivîn êdî warê  
min  
ê xewn û xeyalên Gulîzer, Armê, keç û jinên têkel ko min li Mûsil û  
Bexdayê nasîbûn û gotin û stranên ko min niha ji her carê bêtir  
dixwest  
li hev bianiya û jê hunereke bedew afiranda, bû.  
Xwendina min, kitabxana Mam Sefo, ger û geştên min, sûtalî û to-  
laziya min, avahiyên xirbe ko bala kesî nedikêşandin, kal û pîrên  
pişt-  
ozîk û diranketî ko kesî li gotina wan guhdarî nedikir, çolên qiraç ko  
muhtacî dilopeke avê bûn, golên ko di nav çiyên de xwe veşartibûn,  
ze-  
viyên ko di bin tava germ de stû xwar kiribûn, xanên gemarî ko tê  
de î-  
san û mişk bi hev re diniviyên, gundên birçî ko dûkel û ardûyên wan  
vemirîbûn, qonax û malixaneyên şewitî ko hew bala kesî dikêşand,

hewş û eywanên fireh ên dêrên qedîm ko tê de çêla ders û  
tecrubeyên bi  
hezaran salan dibû û ew hemû însan, seyda, feqe, keşe, metran,  
şivan,  
mîr, beg, diz, qeşmer, kedxwar, zordar, parsek, sextekar, neçar,  
feqîr, pîr,  
durû, dilsoz, bayê destê sibê ko strana tofan û afatên herî kevn ên  
în-  
saniyetê hê jî digotin, berf û baranên ko hukimdariya kayînatê bi  
bîra î-  
sên dixist, mar û marîjokên ko li pey medeniyetên kevnare mabûn,  
hemû  
bi hev re alîkariya min kiribûn da ko ez bibûma însanekî xwedî ders  
û

197

tecrubeyan. Lê ez hê jî însanekî bêkar, bêşixul û bênav bûm.  
Herçiqaş  
min ji kesekî din re negota jî, mîn nav, şan, şoret, afirîn, berhem û  
şixulê  
hûnandin û lihevanîne diviya.  
Ez dengbêj im, bi tenê dengbêj, min di nava nivînan de, ji xwe re  
dig-  
ot, ne tişteki din, ne tucar û bazirgan, ne esker û şervan, ne alîm û  
şewirmend, ne beg û mîrzan, ne jî şivan û gavan, bi tenê kesekî ko  
bi  
dengê xwe, bi gotina xwe diafirîne, bi gotinê dijî, bi gotinê radibe.  
Lê ne  
mîna dengbêjên şox û şengê ko li pey kêf û henekan in, mîna  
dengbêjekî  
ko dikare bi alîkariya gotinê jana çavê xwe yê kor û birîna ruhê xwe  
yê  
şikestî derman bike.  
Di wan rêwîtiyên xwe de, çaxa ez di nav deng û pêjnên dewr û



dewranên windabûyi de, bêyî çu hedef û armancê, digeriyam, min  
bîr bi  
tişteki bir; tenêti. Tenêtiyeke kûr, qehîm û dûr diviya da ko însên  
bikaribiya bibihîsta, bijiya û biafiranda. Tenêti ko ji bo însanên me  
yên  
kom û eşîran, tişteki zahf xerîb bû, kozeke agirê manqelê bû ko  
huner-  
mend diviya bi destên xwe pêgirta. Deng, yanî dengê sade, zelal û  
rast ko  
dengbêjekî hêja hertim diviya, di nava bêdengî û tenetiyê de nezîkî  
li îns-  
sên fikir. Bêguman ne bangê hemû dengbêjan yek bû, ne jî dengê  
wan  
mîna hev bû, lê dengbêjî ne bi tenê deng û hunera awazê bû, jê re  
xîretek  
ko her berdewam bû, sebatek ko tevî her zehmetî li dar bû,  
metanetek ko  
dikaribû xwe li ber her tiştî rabigirta û hêzek ko tevî hemû  
mûsîbetan  
dikaribû biafiranda jî diviya, da ko dengbêj bikaribiya riyeke xas bida  
ber  
xwe û nemiriyek ji dengê xwe biafiranda. Çu baweriya min bi  
dengbêjên  
ko berdevk bûn û nikaribûn riyeke xas bidana ber xwe, nîn bû, ji  
lewre jî  
min tenêtiyeke kûr, dengekî xas, riyeke taybetî û awaz û gotineke  
cihê di-  
viya. Gotinên pak û germ, şeweyekî nû û cihe, çel û qalên balkêş û  
li-  
hevhatî, zimanekî nû yê sade, tazî û ji şox û şengan dûr, ko gotinên  
wî li  
bêjing û seradan ketine, ko tê de şopa hûnandineke xurt diyar e, tê  
de

dengê fikir, guman û wicdane hertim tê bihîstin... min ev xusûsiyet di-  
viyan.

Qewlê min, ez bawer im, hê di zaroktiya min de, bi ders û şîretên  
Apê

Xelef, diyar bû; ez ê nebûma darek ji darên daristanekê, lê ez ê  
bibûma

dara tûye ya qehîm a qiraxên çemê Dîcleyê ko şahidî li pêwendî,  
bûyer,

qeder û gotinên têkel dikir û jê, ji bo nêrevan û guhdarên  
giranbuha, ders

û tecrubeyek diafirand. Ders û tecrubeyeke nû, lê di eynî wextê de  
mîna

çiyayê Cûdiyê, çiyayekî ji zincîra çiyân.

Gotina min û cûreyê vegotina min diviya sade û zelal bûya. Lê  
sadebûn

198

û zelalî ne şixulê herî hêsan ê dengbêjekî bû, ji bervajiyê, heye ko  
şixulê

herî dijwar bû, ko jê re zanîn, huner, quwet û sebir diviya. Heta ko  
deng-

bêj her tişt û hemû xirecirên rojane li pey xwe nehiştta û neketa nav  
kûrahiyên dangan, nav kitekitên bûyer û pêwendiyên aloz û têkel,  
çu

carê ewî nikarîbû xwe bigîhanda gotineke sade û dengêkî zelal.  
Dengbêj

diviya jê çi dihat, teksîr nekira, ne zexelî, ne jî sistî, her û her  
lêhûrbûn,

lênêrîn, afirîn û gotin. Careke din, careke din, ji nû ve, bi awayekî  
nû, bi

şeweyekî cuda, heta ko dengbêj bibûya dengbêj, yanî hosteyê  
gotinê. Ez

hîn bûbûm; gotin dikarîbû best, hest, kel û hîsên însanî bigîhandana  
în-  
sanana, lê gava gotin bi şeweyekî sade li hev hatibûya, bi awayekî  
zelal bi-  
hata gotin.  
Guhdarno, yek ji dersên hemû heyata min eva hanê ye; gotina ko  
di  
xizmeta însên de ye, dikare xapînok be, deng dikare însên bixapîne.  
Gotin dikre, ji ber şert û mercên doralî, gelek tiştan li xwe qedexe  
bike.  
Gotina xav û nekemilandî ko ger bi niyeteke çê, ger neçê tê gotin,  
dikare  
daxwaza herî xweş a însanî jî têk bibe, dengê ko ne ji dil, lê ji ber  
rewşê tê  
gotin, tevî ko ew çêla hîs û xwestekên herî însanî jî bikin, dikare  
dinyayek  
ji derewên pûç raxîne ber çavan. Tu dê çawan li bilûre bixîni, tiliyên  
te dê  
bi çî ahengî li ser qulên bilûrê bigere, tu dê tîlên tembûrê bi çî  
şeweyî bîni  
zimên, tu dê ji kîjan gotinan dengên çawan biafirîni? Tu dê di nav  
perdeyên deng û awazê de çawan bi hostehî bigerî? Tu dê  
yekîtiyeke  
têkûz û qehîm di navbera dewlemendiya gotinan, hunera gotineke  
nû li  
ser hîmekî kevnare, pergala lihevanîna wan, ahenga gotinê,  
hûnandina  
wan û ûslubê de çawan bîni pê? Hunermendiyeke hêja ko nabe  
koleya  
şert û mercan, bersîva van pirsan ji we dixwaze, gelî guhdaran.  
Ji lewre ez li mezêlê xwe yê xewê ko êdî ne bi bîhna tir û fisên Heme,  
lê

bi bîhna xwîdan û avikê tijî bû, di nav nivînên xwe yên gemarî de  
dirêj  
dibûm, piraniya caran dest û tiliyên min di nav şeqên min de, min  
gunik  
difirkandin û ez diketim kêrahiya haletên însanî û li dangan, li  
gotinan,  
li şêwe û çeşnên lihevanîna wan difikirîm.  
Rojekê ko dinya êdî ber bi biharê diçû û hewa, mîna ko ew henekên  
xwe bi însen bike, di rojekê de heye ko bîst caran xwe diguherand,  
ji xu-  
naveke boş, tafilê diqulipî ser taveke germ, danê êvarê, ez çûm  
mala Mam  
Sefo ko bangî min kiribû. Mala ko hertim jê dengên têkel dihatin,  
niha  
bêdeng bû û zarokên malê Migo û Armê çûbûn welatê jor. Migo  
tevî  
keriyekî pezê mêşîn çûbû Mikusê û ewî xweha xwe jî bi xwe re  
biribû da  
ko ji wir ew biçûna welatê Wanê, nik xismên xwe yên xalan û dayika  
xwe  
199  
ko li wir diniviya, ziyaret bikirana. Gava ez gihîştim malê, qata jor,  
warê  
me hemûyan kitabxanê, Mam Sefo li ser sedirê xwe, şal û şepik lê,  
li ser  
sînga wî kitabeke qalîn a vekirî ko berbixûn bû, çavên wî girtî  
niviyabû.  
Bi ketina min a hundir ew hişyar bû û xwe da hev, rabû ser piya.  
Por, sim-  
bêl û rîha wî êdî spî bûn, fera ko hertim li ser bîbikên çavên wî bûn,  
niha  
tefiyayî bû û tevgera wî, li gora bedena wî ya girs, girantir bûbû.  
Were Biro, ewî gote min û çû deriyê şaneşînê vekir, were kurê min.

Baran sekinîbû û taveke helesor lê dabû, bîhna axa şil ko ji hawîrdor difûriya, heta ber difnên me dihat. Mam Sefo ko ji bervajiyê ehlê Cizîra

Botanê hîç tişteki ji bîr nekiribû û ji jibîrkinê nefret dikir, heyama nû

ko aram û sakîn dixuya, mîna rojên sakîn ên beriya tofana Nebî Nûh didît û hertim gotina xwe dubare dikir da ko em bi tevdîr bûna. Lê îcar

ewî ji bo tişteki din bangî min kiribû.

Piştî ko çay hat û me çaya xwe vexwar, ewî qelûna xwe bi titûneke zer

a veçirî dewisand, ew pêxist û jê gurzek, du gurz kêşand, gote min, Kurê min, piştî çend rojan Newroz e, bi hênceta Newrozê, Mîr şênahiyên gumreh li dar dixîne da ko dost jî, dijmin jî bibînin. Şeva Newrozê, di qesra Mîr de, du tişt têne pê, yek, Mîr û mîr, beg û giregirên

hemû welêt ê li Birca Belek şîva êvarê bixwin; dudo, li xanê jî şevbuhêrkeke dengbêjan li dar dikeve. Ez dil dikim, tu jî li wir bî.

Mamo, min gotê, carek, du caran kuxiyam, jê hineki bi dûr ketim, çûm

li bin lewha teyrê tawis sekînim û min gotina xwe domand, te dît, bav û

kalan gotiye, bêyî şêx û pîr mere dîwana mîr. Min ne şêx hene, ne jî pîr,

ez rebenê Xwedê çi bikim, çawan herim dîwana Mîr?

Biro, kurê min, dev ji henekan berde, eve, ne bi tenê daxwaza min e, şe-

va berê, li qesrê, di hizûra cimatê de, Mîr tu û hal û hewalê te ji min pirsî.

Ewî tu, cara yekemîn, di şeveke Newrozê de dîtiye û dixwaze dîsan di

şeveke Newrozê de bibîne. Ew ê jî bê şevbuhêrkê. Ew dil dike ko tu li wir

bî.

Min hew dikarîbû tişteki bigota û ez ê neçar biçûma şevbuhêrkê.

Tirsa

min ji şevbuhêrkê nîn bû, lê heke tişteki bihata xwestin, min ê li wir

çi

bigota?

Bi minasebeta Newrozê, sê roj û sê şevan ehlê Cizîra Botanê kêf kir, xwar, vexwar, govend girt û her celeb şênahiyên welêt li dar xist.

Sifreyên

ko bi sedan kes, li pey hev, lê rûdiniştin û jê radibûn, tevî her texlîd xwar-

inên Cizîra Botanê, hatin raxistin, zarokên ehlê misilman, hatin sinet kirin, dawet û dîlan li dar ketin, mahra xort û keçên xama hatin birîn

û

200

roja dawîn, êvarê, li xana qesrê, şevbuhêrkeke dewlemend a dengan hate

pê. Xana qesrê di binê malixana mîrzayên malbata ezîziyan, yanî mal-

bata Mîr bû û li gora gotinê, mîrza Bengîn ko di çîroka Memê Alan de,

birayê Zîna Zêdan bû, ew ava kiribû. Xana ko di nav kelehê de, ji bo mê-

vanên mîrekiyê hatibû ava kirin, rasterast di bexçê re xwe digîhand çêm

û kesê ko bixwesta, dikarîbû di ser çêm re jî, bi qayik û kelekan bihatayê.

Xan bi kemeran lêbûbû û her kemerekê mîna mezelekê hatibû raxistin.

Mîna ko însan li hemamê bûya, deng li wir perde bi perde bilind dibû,

olan dida û heye ko ji ber vê yekê dengbêjan ê şevbuhêrka xwe ya Newroza wê salê, li wir, li dar bixista.

Min cil û bergên xwe yê herî nû û paqij ko bi destê hurmeyên mala  
Mam Sefo hatibûn şuştin, li xwe kirin, simbêlen xwe badan, ew bi  
rûnê  
behîfê biriqandin, girêkeke qehîm avête doxînê, xwe da hev û ez bi  
rê ke-  
tim, çûm qesrê, nik Têlî ko li medresa qesrê li hêviya min bû. Têlî ko  
mî-  
na min bejndirêj bû, lê ne mîna min ji çavekî, ji herdu çavan kor bû,  
mî-  
na mamê xwe Salih Beg, bûbû seydayekî tamam. Em bi hev re  
daketin  
jêr, xanê. Tevî ko êvarê hê nû dest pê kiribû, hema çî bigire xan tijî  
bû û  
her komeke dengbêjan mezelek vegirtibû, lê li gora qewle cîhê  
edebê. Li  
welêt mîr hebûn, beg, axa, şêx, alîm, milkdar, bazirgan, keya, rîspî  
û gire-  
gir hebûn. Dengbêj, çîrokbêj, bilûrvan, sazband, qasid, berdevk û  
qeqşmerên wan hebûn. Herkes diviya di meclîs û dîwanan de, di  
şevbuhêrk û civatan de li gora cîhê xwe yê edebê rûnişt. Xana Mîr  
ê wê  
şevê li gora qewlê cîhê edebê ko seyis û keyayên qesrê bi rê dixistin,  
ji  
dengbêj û tembûrvanên navdar û xwedî huner ko ji her aliyên welêt  
hat-  
ibûn, heta sibehê, bi dengên wan bigeriya.  
Ez, Têlî û du peyayên pê re, em çûn mezelek ko pîr û feqîrên  
êzidiyên  
welatê Serhedê lê rûniştibûn. Êzidiyên rîhdirêj, cilspî û libasdirêj,  
tevî  
def, erbane, bilûr, saz û tembûrên xwe, rûniştibûn û hêdîka qewlên  
xwe,

mîna stran digotin. Şîv hatibû xwarin, şerbetên têvel û ava hinaran  
hati-  
bû vexwarin, sifre rabûbû û dor hatibû gotinê. Gotin, kilam û stran  
mezel bi mezel digeriya, ji yekî vediguhezî yekî din û her mezelê ko  
gotin  
werdigirt, bi deng, awaz û ûslubên heremên xwe, carina bi dengê  
deng-  
bêjekî, carina bi dengê komê, geh bi stran, geh bi çîrok, renekî nû  
dida  
gotinê, ew dixemiland, bi qasî çendekê digot û paşê dewrî mezelê  
teniştê  
dikir. Her tiştê ko ji bo stranekê diviya, ji seyd û nêçîrê bigire heta  
şer û  
pevçûnê, ji evîn û sewdayê bigire heta dexesî û hesûdiyê, her tişt di  
nav  
gotina ko digeriya de hebû. Salixdan, lihevanîn, pesn û methiye tijî  
bûn.

201

Yek bi straneke Beriya Mêrdînê radibû û digot,  
Paşil tûştirê û kemal keroşkê  
Bisk bi têtê û pêşmal şînê  
Ser bi zêrê û diran sedefê...  
Di nava serê wê de çil û şeş kezî ne  
Tiliyên xwe ji mûm û şimayê birîne  
Yekî din ji mezelê teniştê gotinê werdigirt, berî ko dest bi stranên  
heremên xwe bike, ji bo nîşandana hunermendî, jîrî û zanîna xwe,  
strana  
ko dihate gotin, didomand.  
Siphan ji Xwedê re  
Tu dibêjî, newqa xwe ji keroşkê û çavên xwe ji xezalê dizîne  
Xurmîn dikeve toq û beniyên  
Şewq û şemala vê xezalê davêje çol û çiyên  
Davêje ser deryayê li ser piştê gamasiyan...



Bala min li ser wan, guhê min li ser gotina wan, di devê min de ne gotin,  
lê hejîrên hişk û behîv, ez difikirîm; gelo hêz û quweta van însanan çî bû?  
Mîna beg, axa û şêxên wan, çek, sîleh, mal, milk û pereyên wan nîn bû,  
piraniya wan neçar û belengaz bûn, lê tevî vê yekê navekî wan, rêz û rêz-  
dariyek ji bo wan, quweteke wan hebû. Helbet, min digote, quweta wan,  
gotina wan bû. Beg û axayên ko dengbêjan dipesinandin, dibûn xwedî  
nav, şan û şoret, yên ko dengbêjan çêr û nifir lê dibarandin, ne li nik xelkê,  
heye ko li nik jin û zarokên wan jî rûmeteke wan nedima. Gotin,  
tevî her tiştî, xwedî hêzeke diyar bû ko di şeva xana Mîr de li dar bû.  
Derengê şevê, ew dema ko herkes li hêviyê bû, hate. Pêşî kurtepişt û  
tevgerek kete nav şênîyên şevbuhêrkê, paşê peyayên çekdar ên Mîr hatin  
û li hemû doralîyên xanê belav bûn, bi dû wan re jî berdevkên Mîr û  
dawiya dawîn jî Mîr. Mîrê ko me hertim navê wî dibihîst, ne bi tenê bi  
comerdiya xwe ya bêpayan, bi seyd û nêçîrên xwe yên bi heftan û bi  
hostehiya gerandina karê mîrekiyê, herweha bi doxîna xwe jî nas bû û ji  
niha ve çar jin kiribûn, xwediyê bi qasî deh carîyan bû û hejmara zarokên  
wî her roj zêde dibûn; Mîrê ko mîna canbazekî di navbera osmaniyan,

farisan, mîrên kurdan, axa, beg, şêx, mertan û keşeyên tirk, kurd,  
ermen,

ereb, ecem, aşurî, nastûrî, suryan û keldanan de diçû û dihat û roj  
bi roj

202

hem nav û navnîşana xwe hem hukim û mîritiya xwe bi pêş dixist,  
niha,

di nav şal û şepikên sade yên botî de, kolozekî rengîn li serî, rîh û  
sim-

bêlên wî biriqî, rûken, awirgeş, bi bejn û baleke tamam lê ji min bi  
qasî

bihustekê kintir, li nik me, li hember me bû. Li dora wî bi qasî deh,  
panzdeh kesên din ko Mam Sefo û Yezdînşêr jî tê de bûn, hebû. Mîr  
û

koma li dorê, piştî ko şênîyên ko bi hatina wî rabûbûn pê, dîsan li  
cîhên

xwe rûniştin, dest pê kirin û giran giran di navbera mezelên xanê de  
geriyan. Berdevkên Mîr kom, kes û dengên xanê yek bi yek bi Mîr  
didan

nasîn û ewî jî, bi ken û kêf bi wan re sohbet dikir. Çaxa ew û kom  
hatin

teniştî mezelê me, tevî ko Têlî li nik me bû, ewî silav da me û berî  
her kesî

halê min pirsî. Ewî ez ji bîr nekiribûm, bi ken gote min,

Biro, xortê qenc, ez her ger û geştên te, gotin û kirinên te dibihîzim.

Qesta wi bi gotina »kirinên te« çibû, ez tenegehîştim, lê mîrekî ko  
destê

wî dirêj bû û li her deverî sîxur, qasid, peya û însanên wî hebûn,  
bêguman

dikarîbû bi gelek tiştan bizanibûya. Mîrê ko li dora navê wî  
efsaneyek

hatibû pê û pirî caran, ji ber sertî û tûjiya pergalên wî yên civakî,  
navê wî

xofeke kûr dida însên, niha, mîna min û Têlî, mîna feqîrên êzidî, li  
nik

me, bi me re, bi zimanekî sade ko mîna zimanê xelkê sade bû,  
dipeyivî.

Tevî ko mîrekiya wî dewlemend, erd û axa wî bêsînor, mal û milkên  
wî

bêpayan, hatin û heyinên wî bêdawîn bû, cil û bergên wî, kenê wî,  
ax-

aftina wî, tevgera wî, her tiştê wî sade bû û mîna xelkê botî û ehlê  
Cizîra

Botanê ko jê hez dikirin, vê sadebûnê germahiyek xiste dilê min jî  
ko ji

wê rojê û pê ve, her û her dewam kir. Lê belê dengê wî ko tê de hêz  
û

quweteke diyar hebû, digel ko ew bi zimanekî sade dipeyivî, dengê  
mîr,

hukimdar û desthilatdaran bû. Gotinên wî bijarte, pêjnên gotinan  
giran

û lihevhatî bûn.

Sefo, Yezdînşêr û Têlî her pesnê te didin û dibêjin ko tu bûyî  
dengbê-

jekî jêhatî, ewî li hember bêdengiya min gotina xwe domand. Eve  
rast e,

gelo?

Na, mîrê min, herdu destên min li ber min, mîna Têlî û hemû kesên  
mezêl, li ser piyan sekinî, min gotê, zêde dikin. Dengbêj, gula civat

û

govendan in, îcar herçî ez im, hevalên min dibêjin, ez stiriye gulan  
im. Ez

li kû, dengbêjî li kû!

Na, na, dev ji şermokiyê berde, ez dizanim ko tu ne şermok î, ewî bi  
ken got, dibêjin, gotinên te, salixdanên te ji ehlê din cihê ne.

Heke ew gotin û salixdan mîna gotin û salixdanên stran û şîran bête

hesêb, min bi nermahî got, ew, ne gotin û salixdanên bi şox û şeng in. Ne

203

yên kêf û henekan in.

Baş e, ewî got û hate nik min, bi destê min girt, em bi hev re, li ser mehfûr û doşegên raxistî rûniştin, bibêje min, ew gotinên çi ne? Heke em wan mîna gotin bihesibînin, hingê heye ko ew gotinên dewr

û dewranên jibîrbûyî, bûyerên kirêt ên windabûyî û hîsên ko nayên xuyan in.

Yanî tu dibêjî, ewî çavê xwe li koma ko niha rûniştibû, gerand, keniya

û gote, gotinên te şerh divên?

Naxêr, min bi lava li Mam Sefo û Yezdînşêr ko li hember Mîr û min rûniştibûn nihêri û gotê. Gava Mîr û ez, li teniştta hevûdu rûniştin, hingê

min ji nêzîk ve dît ko Mîr rîh û simbêlên xwe hene û birû û mijangên xwe

kil kiribûn. Ne şerh, Mîrê min, min gotina xwe domand, lê heye ko îh-

san wan bikaribe bi çend cûran têbigihê, bi çend şêweyan hîs bike.

Yanî

mîna çemê Dîcleyê ko bi tenê diherike, lê kesên ko lê dinihêrin, li ava wî

guhdarî dikin, bêguman, bi cûreyên cihê difikirin û dibihîsin.

Mîr keniya, welê dixuya ko kêfa wî ji sohbeta tiredînekê re hatibû, ewî

lingên xwe avêtin ser hev, ji sêniyê çend lib mewîj girtin û avêtin devê xwe

û pirsên xwe domandin,

Dîcle diherike, Biro, kurê min, herkes çem dibîne, herkes dizane ko çem li vir e û diherike û herkes dibîne ka ew çawan diherike. Ma jê re cûre

û şêweyên cihê divên?

Herê Mîrê min, ew diherike, min gote, lê ji hezaran salan û vir ve.

Dîcle

şahida gelek dewr û dewran, gelek hatin û çûyinan, gelek şer û pevçûnan,

gelek qise û gotinan e. Di nava pêlên wê de ko bi lehiyên biharê radibin,

gelek deng hene. Heye ko ez di ava çemê Dîcleyê de sûretê Adem û Hawayê dibînim, dengê tofana Nebî Nûh dibihîsim, lê dengbêjekî din

heye ko sûretê beg û axayê xwe tê de dibîne û dengên şox ên dîlanekê

dibihîse.

Ma ev hemû tiştên ko tu behs dikî, pêwist in, xortê jîr? Ewî bi dîqet li

rûye min ê qelişî û çavê min ê kor nihêrî û got,

Herê Mîrê min, pêwist in, heke ne ji bo kesekî din be, ji bo min pêwist

in, da ko ez têbigihêm çima rûyê min qelişîye û çavê min derketiye...

Çemê Dîcleyê, rast e, Mîrê min, li cihê xwe ye û her diherike, lê di kûrahiyên ava wî de dengin û bersîvin hene, bersîvek ji bo min, bersîvek

ji bo dengbêjekî din, bersîvek ji bo çîrokbêjekî din ko li pey pirs û bersî-

van e...

Çaxa bêdengiyek hate pê û çavê min bi awirê tûj ê Mam Sefo ket, hingê

204

min fahm kir ko gotinên min ên dawîn zêde bûn û ne li gora edebê bûn.

Mîrê min, Mam Sefo, bi dengê henek, gote, Biro şîrekê lêdike, şîrek

ko çêla serpehatiyên Dîcleyê dike, eger te jî dil hebe, bila Biro ji me re

şîra xwe bixwîne.

Mam dîsan gihîştibû alîkariya min. Mîr bi dengekî berz ko ji hemû aliyên xanê dihate bihîstin kenîya û gote, çima na, çima na.

Dengê strana Dîcleyê ko hertim di heş û dilê min de bû û hûnandina wê

ko rêzine jê bi leza birûskê lêbûn, rêzine jê mîna meşa kîsoyekê bi dirê-

jahiya salan, hema çî bigire hemû umrê min girt û çu carê jî bi dawî ne-

hat, li çu deverî bi temamî nehate gotin, wê şevê weha bilind bû;

Dîcle me ez, qirîna hezar salan,

Girîna nû ya îro,

Şahid im ez, wext, dewr, dewran

Xewn, xeyal, hêvî

Olana qîrînê, nalîna girînê

Şev, roj, heyam, meh, sal,

Tav, heyv, stêr, hemû bi min re,

Hemû di deriyê min re borî

Dest im ez, li ser deriyên dewr û dewranan

Derî vedibin yek bi yek

Deng dertên, kite bi kite

Riya min, ji jor ber bi jêr

Di nav hemû xweşiyen dinyê re

Di nav axa reş, axa sor, axa kils re

Ax, ez im, ax hêza min...

Hêşinahî, geşî û xweşî

Bereket, ber, heyina axê

Hemû ez, hemû Dîcle, hemû ji min

Rehê min di nav axê de, pê re

Asimanên wê, ewrên wê

Bi çivên min rengîn, bi şewqa min çirûsî

Û pêlên min, bi ba, baran û lehiyan rabûyî

Çavê min, bijangên min

Nobedarên wextê, heyam û dewrê

205

Û qirîna min, li ser axa şewitî

Di nav çiyayên xopan, geliyên kûr de

Ev çi hal e, ev çi hewal e?

Ka welatê aş, ka zemanên baş?

Dîcle me ez, sebra hezar salan

Li ber ba û bahozê rawestî

Li ber agir û şewatê xwe ragirtî

Li hember lîstikên bîr û heş her zînde

Berxwedan qewlê min e

Ne ji çavsoriyê, ji bêgaviyê

Ne ji zordestiyê, ji bêçaretiyê

Rê û bend li min tîn girtin

Ne îro, ne do, ne pêr, hertim

Lê rewan im ez, hertim geh ji vir geh ji wir

Di nava qelîşkên keviran, bihurên zinaran, newalên çiyar re

Ez im, dengê ava qedîm

Dengê min mîrat ji do, mîrat ji bo sibehê

Dengê min di ser şer û pevçûnan

Di ser birîn, mirin û kuştinan re

Bi te re ho însan, ho dilê birîndar, ruhê sûzen

Ho nifşên do yên ketî, nifşên bê yên sext

Ho însan, xwediye mîratê

Tu li kû yî?

Te li kû hembêz bikim, bihewînim

Bi dengê xwe, bi mîratê bihebînim

Li kû dinya kete xewê

Keser, derd, xizîn û birîn sincirî

Deng hate birîn

Li kû deng hişyar dibe

Li kû ez ê dengê xwe bigihîm te, ho însan?  
Dengê kîn û nefretê çu carê ji axa welatê bindest, tevî ko Mîr û  
mîrekiyê  
ji bo aştiyê hewl didan û her tişt dikirin, bi dûr nediket. Dewlet nîn  
bû,  
îdareyeke yekgirtî nîn bû, serekekî ko ji hemû şax, pî û milên welêt  
dihate  
qebûl kirin nîn bû, hez û evîneke neteweyî nîn bû. Welat ji mîr,  
mîrekî,  
206  
herêm, eşîr, qabîle, bavik, mal û malbatan dihate pê û di bin hukim-  
dariya osmaniyan de, her yek bi serê xwe hukimdarê navçeya xwe,  
ehlê  
navçê bû. Mîrê Zirav ko êdî hew zirav bû û zik lê mezin bûbû û ji  
dest-  
pêkê heta dawîn hertim ji bo yekîtiyeke xurt dixebitî, heye ko mîrê  
yekemîn bû ko di welêt de, li ser axeke zahf fireh hukimdariya xwe  
anîbû  
pê. Ewî di destpêkê de di navbera eşîr, mal, bavik û malbatên Cîzîra  
Botanê de yekîtiyek anî pê, bi dû re jî di navbera mîr, beg, şêx û  
axayên  
cîran de. Di wan rojên şevbuhêrka Newrozê de ko min qalê kir, halê  
Mîr  
û mîrekiyê heye ko halê herî baş bû; Mîr ne bi tenê li Cizîra Botanê  
her-  
weha di navbera mîrekiyên din de jî bûbû mîrê sereke û bi begên  
Hekaran Nûrilah û Fetah, begên Wanê Derwêş û Xan Mehmûd,  
begê  
Xizanê Xalid, begê Qersê Husên Begê Kor, begê Mûşê Şerîf re  
pêwendiyêke xurt anîbû pê. Şêxên neqşîbendî û qadirî, şêxên êzidî,  
terîqetên sunî, şafî, henifî û elewî, malek û metranên filehan,  
hehamên



cihûyan, hemû li doralîyên Mîr mîna perwanê dizivîrîn û cîhê xwe,  
li go-  
ra cîhe edebê, li tenîştta beg û gîregîrên kurdan digirtin.  
Ji ber kirin û tevgerên Mîr, êdî herkesî dizanîbû ko ew bi quweta şûr  
bawer bû. Gerandina şixulên mîrekiyê bi pergaleke gelekî sert û  
îradeyeke mîna pola dimeşîya, li her aliyê mîrekiyê zîndanên tarî ko  
xofeke mezin dixiste dilê xelkê lêbûbûn, diz, sîxur û keleş bi xurtî  
diha-  
tine cezakirin, carina dest û milên wan jêdibûn, carina jî serê wan,  
kes û  
begên ko gava xwe li gora pergala mîrekiyê nedavêt, pirî caran pêrgî  
ceza-  
yên giran û heta pêrgî mirinê dihatin û begên ko li hember Mîr  
tevger  
girêdidan, ne bi tenê ewana, lê mal û malbata wan jî tê de, di agirê  
xeze-  
bê de dihatin sotin.  
Di wan sohbetên me yê kitabxanê de Mam Sefo ev celeb  
gerandina  
şixulê mîrekiyê weha bi nav dikir; edaleta şûr. Edaleta ko bi şûrê tûj  
di-  
hate pê.  
Mîr bi hêz û quwetê bawer e, Mam Sefo, bêyî ko ew bi xwe pê  
bawer  
be, carina kenekî zirav, carina endîşe û sûzenîyeke diyar li ser rû,  
digot,  
Mîr hertim dibêje, yekîtiya welêt ê pêşî bi şûr, bi darê zorê û bi tîrsê,  
paşê  
jî bi rêz û rêzdarî were pê. Zimanê ko ehlê welêt û ehlê osmanî jê  
fahm  
dike, fizîna şûr û teqîna berikên tivingê ne, – şûrê ko jê xwîn dilop  
dike,  
berikên ko di sînga însên de diteqe. Şûr û tivingê pêşî yekîtiyekê di

navbera mîr, beg, axa, şêx û ehlên têkel ên welêt de bîne pê û bi dû  
re jî

îstîklala yekîtiyê. Pêşî perçebûnê ji holê rabe, paşê jî bindestî. Pêşî  
li welêt

haş, paşê jî riya kaş a îstîklalê.

207

Ji lewre aşî û aramiyek li ser axa Cizîra Botanê ko warê her celeb  
rêbir

û keleş, dizî û talanê bû, hatibû pê, xelkê ko hertim li ser riyân pêrgî  
keleş

û dizan dihatin, niha bi rehetî diçûn û dihatin, gundên dûr ko bi tirsâ  
êrîş

û talana çavsorân dikete xewê, niha bêyî çu endîşê dinivîyan, tirsâ  
cîranên

ko hertim dikarîbûn xayîntî li cîranê xwe bikira û tirsâ keleşên biyanî  
ko

ji qonaxên dûr dihatin û gund kaviîl dikirin, nemabû, herçend  
girtîgeh û

zîndan tijî bûn, mal û milk jî ewçend bi serbestî dihate kirîn û firotin,  
hêzên çekdar ên mîrekiyê bi şev û bi roj di navbera tixûbên mîrekiyê  
ko

roj bi roj firehtir dibû, diçûn û dihatin û dawet û dîlan bêtirs li dar  
diketin, pez û dewar, bêyî çu tahlûkê, derdiketin deşt û zozanan.

Ji bo ko aşî û hizûra mîrekiyê û hemû navçê berdewam be, hertim  
civîn û civat li dar bûn. Herçî Mîr bû, ewî jî, çaxa gotin dihate ser  
mese-

leyên giran û girîng, hemû beg, axa û giregirên welêt, tevî  
şêwirmend,

aqilmend, kumandar, seyid û şêx-ul îslamên mîrekiyê, li dîwana  
Birca

Belek berhev dikirin û bi wan dişêwirî, li dîtin û pêşniyarên wan  
guhdarî

dikir, bersîva pirsên wan dida, da ko tevliheviyek neyê pê û aloziyek

nekeve nav wan.

Lê belê tevî van hemû tiştan, aştîya ko Mîr bi darê zorê anîbû pê,  
tevî

hukmê şûr û tivingê, aştîyek bû ko bi tayên qels, li ser erdekî fireh ê  
neqe-

hîm, mîna pîneyên cilekî riziyaî, hatibû dirûn. Aştîya ko Mîr anîbû  
pê,

mîna bendeke qels bû ko li ber lehiya rabûyî ya Dîcleyê hatibû  
lêkirin.

Beroşa ko ji sedan salan û vir de her dikeliya, bi saya serê Mîr, hinekî  
kela

wê danîbû û Mîr devê beroşê girtibû, lê beroş dikeliya û osmanî,  
faris û

qasidên dewletên rojava ko hêz û quweta wan di her şert û mercî  
de ji ya

mîrekiyê zêdetir bû, hertim êzing davêtin agirê ko beroş li serê bû  
û ew

gur dikirin. Dijminahî, berberî, pevçûn, şer, hesûdî, dexesî û  
çavnebarî di

navbera ehlê ko ji osmaniyan pê ve çu carê çu dewlet nenasîbû,  
bêpayan

zehf bûn. Ehlê welêt li hember gotina dewletê û paşayên rîhpalik û  
dilqa-

lik serê xwe ditewandin, lê li hember hevûdu dibûn şêr û piling.  
Giyayê

hewşê ji wan re tahl bû, lê jahra paşa, miteserif, esker û tahsîldarên  
os-

maniyan, ger ji ber bêgaviyê, ger ji ber cehaletê, ji wan re şekirê  
şêrîn bû.

Ew xusûsiyetên ko min berê ji bo osmaniyan qal kir, ji bo kurdan jî  
rast

bûn; herkes li dijî herkesî bû, herkesî li dijî hin kesên din dek û dolap  
di-

gerandin û li pey kemînan bûn. Herkesî li gora xwe hin kesên din biçûk

û nizm didîtin, quweta xwe ko li hember serdestan têrî serfiraziyeke tamam nedikir, li dijî hin kesên din ko ji wan qelstir bûn, diceribandin.

Xelkê ko hertim, ji bav û kalan vir ve, di navbera du quwetên mezin, 208

osmanî û farisan de hatibûn perçiqandin û çu carê yekîtî û quweteke

mezin ko dikarîbû li hember wan herdu hêzên mezin bisekiniya, ava nekiribû û çu carê nikarîbû tixûbên van herdu dewletan gav bikira û xwe

bigîhanda dinyê, bêguman, bawerî ne bi quweta xwe, lê bi quweta dewletê ko hertim ne bi dilovanî û şefqet, lê bi zordarî û xedarî xwe nîşan

dabû, dianî. Tiştê ko dihate bîra xelkê, bi tenê zordarî, xedarî û tirs bû.

Roj diqulipîn, meh û sal derbas dibûn, stêr geş dibûn û dirijiyan, berf û

baran dihat û diçû, axa kevnare bi tîna tavê û bi tîrêjên şewitî disincirî,

hehecîk, legleg û quling ji welatê çolê dihatin zozanan û ji zozanan vedi-

geriyan welatê çolê, însan dihatin dinyê û piştî umrekî dimirin, nifşek di-

hat, yekî din diçû. Lê tirs, tirs ko bi dengê şûr, tiving û topan ketibû dilê

xelkê, tirs ko pirî caran nedihate zimên, lê kelehên hilweşiyayî, gundên

kavil, xaniyên xirbe, zeviyên şewitî û goristanên li quntarên çiyar şahidî

lê dikirin û bîr û hîsên ko bêdeng çêla tirs, şîdet û xedariyê dikirin, her û

her diman. Xelk, gund bi gund, bajar bi bajar, eşîr bi eşîr, malbat bi malbat, mîrekî bi mirekî, di nav tirseke bêdawîn de, ji dinyayê bi tamamî dûr, di nav keft û leftên rojane de, bêyî hedef û armancên mezin, bêyî şîûreke yekîtî û bextiyariyê, lê bi berberî û dijîtiyên bêhejmar, dijiya. Her gav û hewldana ko ber bi bextiyarî û serfiraziyê, ber bi heyateke hêjatir di-hate avêtin, di dawiyê de, pêrgî felaketên nû dihat. Ne yekîtiyeke xelkê hebû, ne jî bir û baweriya yekîtiya welêt. Xelkê ko ji xwendin û nivisînê, ji perwerdeyî û agahiyê bi dûr bû, bi tevger, bîr, heş, mêjî, fikir û gumanên xwe, zahf teng û girtî bû, gundê wan ji bo wan hemû دنیا, hemû welat, hemû însaniyet bû. Wext û tarîx, bîr û heş, hîs û pêjn, ax û herêm, hêz û quwet, şer û pevçûn, kîn û nefret hemû bi hev re bûbûn yek û ehlê welêt dîl girtibûn. Qedera axa Mezopotamyayê ji dewr û dewranên Babîl û Nînovayê û vir ve her eynî bû; şer, pevçûn û xedarî. Axa Mezopotamyayê, hertim eynî ax bû; herwekî ko di Tewratê de dihate gotin, axa tofan û xezebê. Axa herî kevn a însaniyetê, axa çemên Firat û Dîcleyê ko bi ava xwe medeniyetên kevntirîn anîbûn pê, axa bexçê cinnetê ko di navbera herdu çeman de bû, çemên Zap û Xabûrê yên Tewratê ko di navbera deşt, zi-

nar, çiya û geliyan re bi çiv û fetlanekên fireh her û her diherikî,  
keştiya

Nebî Nûh ko li gora gotinan, li gopikên çiyayê Cûdî veniştibû û  
heyameke nû raxistibû ber însaniyetê, zarok, bav û bavikên ko ji  
pişta

Nebî Nûh ketibûn û bajarên ko ewana ava kiribûn; Babîl, Erek,  
Akkad,

Kalne, Aşûr, Kalah, Resenî, Nînova, Riha, Nisêbîn, Cizîr, ev yekên  
hanê

209

hemû Mezopotamya û axa wê bû.

Axa Mezopotamyayê ko bi erebî jê re digotin »el Cezîre«, yanî  
girava li

ser avê, yanî axa ko di navbera herdu çeman de bû û bajarê Cizîrê  
ko bi

du milên çemê Dîcleyê ve dihate rapêçandin û mîna giravekê ber bi  
we-

latê jêr dibû, cezireyek bû ko di nav derya kîn û nefretê de mîna  
hêlekanekê diçû û dihat.

Axa Mezopotamyayê; axa şewitî, xopan, kavi û hilweşiyayî. Key,  
xa,

hukimdar, siltan, hêz û ordiyên ko hatin û çûn, êrîş, îstila, vegirtin,  
şe-

watên ko bêrawest mîna pêlên deryayeke tofanê, hertim bi ser axa  
Mezopotamyayê de hatin. Kuştin, şewitandin, qetliyam, rev, sirgûn  
ko çu

carê ji vê axê bi dûr neketin. Pêşî samî ko hîmên medeniyetê li  
navçê

avêtin, paşê keldan ko zora samiyan birin û bajarên mîna Babîl,  
Nînova,

Aşûr ava kirin. Bi dû wan re med û persên ko ji welatê bakûr hatin  
û hemû

ax vegirtin, kavi kirin û hilweşandin. Îskenderê Mezin ko zora persan û keysarê wan Daryûş bir. Ez çi bibêjim? Paşê Sasanî, paşê Emewî, Abasî.

Paşê îstilayên moxolan, Hulagû Xan û siwarên wî ko mîna kuliyan ko di her derê ko ew tê re derbas dibûn, kavi dikirin. Bi dû wan re îstilayeke din a Asyayê, ya Tîmûrlenk û tataran. Paşê jî Osmanî ko bi eslê xwe asyayî bûn û ji Asyaya dûr hatibûn. Her yek bi xedariyeke bêpayan navdar, her yek li ser kavi yê din, her yek hosteyê bêpayan ê vegirtin, şewat û kuştinê. Pê li pey pêlê, êrîş li ser êrîşê, bêwest, bêrawest... Her kî ko dibêje, tofana Nebî Nûh li ser vê axa xopan, bi tenê carekê rabûye, rast nabêje, ji ber ko her cara ko pêleke nû ya îstilayê hatiye, tofan careke din rabûye. Pê rabûye, dinya leqiyaye, felekê dev ji çerxa xwe berdaye, wext sekiniye, ba, baran, çûyin, hatin, kerwan, bazar, bêrî, cot winda bûne, giya hêşin nehatiye, dar şax û pel venekirine, gul nebişkovîne, da ko pêla rabûyî dakeve. Piştî ko pêl daketiye, her tişt mîna berê dest bi heyatê kiriye, ba dîsan di navbera pelên darên tûyê de geriyaye, darên hinaran kulîlk vekirine, stêr ji milekî asimên ber bi milekî din xuricîne, mehîn û canû li ser axa ko bi giyayê nû

hêşînhatî mîna deryayekê leylan daye, bi hîrehîr û bi çargavî, dane  
lez û  
bezê, kerwan ji Anatolî û Kafkasyayê di ser riya hevrêşim a  
kerwanan re,  
dîsan ber bi Bexda û Basrayê, Çîn û Maçînê çûne, her tişt di nav  
tevgereke  
xurt de bûye, – heta pêleke nû ko li rê bûye, dîsan rabe.  
Heke hûn tarîxa vê axê meraq dikin û serê xwe bi sebebên vê  
xedariyê  
diêşînin û ji min dipirsin ka dilê min çima bi liyan e, fermo, ji we re  
hem  
tarîxa axê, hem jî ya xedariyê ko tê de çê û neçê, kirêtî û başî, xirabî  
û rindî  
hertim di nava hev de bûne.

210

Heke hûn meraq dikin ka ez çima niha qala van tiştan dikim, fermo,  
ez  
bibêjim we; tevî ko Mîr mîrekî û welêt hinekî aş kiribû, pêleke nû li  
rê bû,  
tofaneke nû radibû. Lê îcar li welatê Hekaran, di nav çiya, zinar, gelî  
û  
newalên kûr ên wî welatî de ko çûyina wî hebû, hatina wî nîn bû.  
Îcar pêl  
di nav ehlê keldanên nastûrî de dikeliya. Ehlê keldan ji bav û kalan,  
ji  
hebûna însaniyetê û vir ve li ser erdê xwe, li nav çiyayên serî li  
asimanan,  
di nav kurdên misilman ên cîran de dijiyan. Tiyarî, Tobî, Depreşan û  
herêmên din ên welatê Hekaran war û axa keldanan bûn. Ew jî mîna  
kur-  
dan di bin hukimdariya osmaniyan de, bi bac û bertîlên ko hem  
didan



dewletê hem jî mîrên kurdan, di nav xwe de bi serbestî heyata xwe  
ya  
kevnare ko bi qewlên Încîla Îsa Mesîh bi rê diket, didomandin. Ew  
bi şix-  
ulê xwe jîr, tevgera xwe xurt, gerandina karê rojane jêhatî û bi  
cîraniya  
xwe dilhebîn bûn. Dêrên xwe di sînga çiyân an di kûrahiyên newalan  
de,  
di nav zinar û şikeftan de vekolabûn, bi hunereke hoste, qûntarên  
çiyân  
qulipandibûn ser bax û bexçe û ava çemên Zap û Xabûrê ko di  
kûrahiyên  
newalan de diherikîn, kêşandibûn serê çiyân û pê bax û bexçeyên  
xwe av  
didan. Digel ko welatê wan çiya bû û cîranên wan kurd bi şixulê pez  
û  
dewaran radibûn, wan di çiyân de, tevî garis, birinc û titûnê, rezên  
tirî  
diçandin û jê tiriyeke şêrîn ko her libeke wî bi qasî pêçiyekê bû,  
radikirin  
û ji tirî jî şerabeke zahf xweş ko li hemû Mezopotamya jorîn navdar  
bû,  
çedikirin. Li welatê wan darên biber ên hejîr, hinar, gûz, givîj,  
şambelût,  
hirmî, xox û tûyê bêpayan zahf bû. Ew jî mîna kurdan eşîr, bav û  
bavik  
bûn û heye ko ji tirsî misilmanan, hertim li tenîştî hev, bi hev re  
dijîyan.  
Hêzeke wan a bi qasî panzdeh hezar çekdarên hoste û jîr hebû û di  
şer û  
pevçûnan de, ew jî tevî kurdan, bi alîkariyê radibûn. Li gora qewlê  
per-

gala osmanî û ya kurdan, wan hem bac didan osmaniyan hem ji mîrê

Hekaran.

Lê belê ez nizanim ka çibûbû, di demên dawîn de wan hew bac didan

kurdan û Mar Şamûn ko serekê wan ê hem dînî, hem civakî bû, hew li

gotina Mîr û Nûrilah Begê Hekaran guhdarî dikir û hema çî bigire li hember Nurilah Beg ko mîna milekî dirêj ê Mîr bû, serî rakiribû. Hin ke-

san digotin ko keşeyên amerîkî, îngiliz û fransewî ko hertim dihatin nik

wan, diketin bin wan û ewana li dijî kurdên misilman sor dikirin. Hin kesên din jî digotin ko osmanî sîxurên xwe li der û dorên wan digerandin

û wan û kurdan bera hev didan da ko herdu mil jî qels bikevin. Hin kesên

din jî digotin ko kurdên misilmanên tûj ko dijminên axretê yên filehan

bûn, bi çêr, nifir, êrîş û dijminahiya xwe, bi şer û pevçûnên xwe, keldan

211

hêrs û har dikirin da ko ew li hember mîrekiyên kurdan rabin û xwe bi-

parêzin û di dawîya dawîn de jî qetl bibin.

Axir her çî bûya jî, devê beroşê dîsan vebûbû û dûmana kela wê ji çiyayên Hekaran dixuya. Lê belê, berî ko ez gotinê bînim ser çiyayê Hekaran û Stêrê, min dil heye ko em dîsan vegezin Cizîrê, mala min, nik

Armê û Gulîzerê...

Dengê vitevit û pisepisa Armê û Gulîzerê di wan rojan de nefes li min

çikandibû. Hingê ez li Cizîrê, li mala xwe bûm û min bi tenê du tişt

dikirin; gunikên xwe difirkandin û şîr û stran lêdikirin. Çavê min ne  
li  
malê dinyayê, ne jî li şan û şohretek ko ji pere, mal û milkê dinyayê  
di-  
hate pê bû. Min nav, navnîşan û şoretek dil dikir, lê bi alîkariya  
gotinê, bi  
tenê bi lihevanîn û afirîna gotina şîr, çîrok û serpêhatiyan. Hevalên  
min  
hemû bûbûn xwedî mal, milk, şan, şoret û zarok. Hin ji wan bûbûn  
xwediyê çend jin û bêhejmar zarokan jî, lê min ne jin û zarok hebûn,  
ne  
jî mal û milk. Mîna civata ko em tê de dijiyan ko hertim dudilî bû,  
her-  
tim xwediyê du heyatan, heyateke xuyayî û yeka nexuyayî bû, ez jî  
pirî  
caran du kes bûm. Kesekî ko bi şixulê rojane radibû, dixwar û  
vedixwar,  
diçû û aliyê Migo dikir, li kitabxanê bi Mam Sefo re dipeyvî, li  
medresa  
qesrê li ayet û hedîsên Têlî guhdarî dikir, li bajarê ko êdî bûbû  
navendeke  
gîrîng a gerandina kar û şixulên welêt û dewleta osmanî, li bazarên  
bajêr  
ko ehl, ziman, lehçe û qewm li wir li bin guhê hev diketin, li  
kerwansaray  
û xanên ko kerwanek dihatê, yek jê diçû, digeriya, li qahwexaneyên  
ko  
hertim tijî bû û bi bîhna cixare, qelûn, nêrgile, tir û fisan mîna  
kulikan  
bûn, rûdinişt, herçiqas kêr bûya jî carina li dawet û dîlanên ko  
hertim li  
dar bûn, dixuya, li şîr û tahziyên ko bi dawet û dîlanan re qayiş

dikêşandin, rûdinişt. Û kesekî din ko hertim bi tena serê xwe bû û  
di nav  
fikir, guman, şik, sûzenî û gotinan de difetisî. Herçend ew kesê ko di  
nav  
şêniyan de bû, xurt û metîn, şên û şeng dixuya, ew kesê li dara  
dinyayê  
tenê jî di dil û ruhê xwe de ewçend sext, sist û dudilî bû. Kesê  
şêniyan dil  
dikir ko ew bi şêniyan re be û mîna kulîlkên spî yên dara behîvê ko  
bi hev  
re dibişkovîn, yek ji wan bûya, lê belê kesê tenê dil dikir hertim cihê  
bûya,  
ne mîna şêniyan rabûya û rûništa û mîna pelê dawîn ê dareke tûyê  
ko di  
destpêka zivistanê de, tevî ko hemû pel weşiyabûn, nedabû pey  
pelên din  
û hê jî bi israr bi darê ve bû û nediweşiya.  
Min, Biroyê dengbêj, yanî ew kesê ko hertim tenê bû, yanî bi gotina  
Gulîzerê, Biroyê belqityo û bedena wî ya xort bûbû esîrê gotin û  
avikê.

212

Min dikir, nedikir, min nikarîbu xwe rabigirta, hem gotin hem jî avik  
bûbûn mîna çemê Dîcleyê û diherikîn. Doxîna min hertim sist, geh  
di  
nav nivînan de, geh li vir û li wir, guhê min li ser dangan, heşê min  
li ser  
gotinan, ez, sersem û peregende digeriyam û min gotin li hev  
dianîn, na  
ne ko min ew li hev dianîn, li hev siwar dikirin. Gotina ko remza  
însan û  
însaniyetê bû, ji destpêka însaniyetê heta îro, bi tenê ji devê însên  
derdiket û bersîva hest û hîsên însên dida. Gotinê hem însan, ehl,  
qewm,

ziman û dîn nêzî hevûdu dikirin hem jî ew ji hevûdu bi dûr dixistin.  
Li  
welatê me jî gotin hem bi şixulê dilovaniyê rabûbû û çîrok, riwayet  
û ser-  
pêhatî afirandibûn da ko me bizanibûya ka dewr û dewranên me  
yên borî  
çawan bûn, hem jî bi şixulê tîr, mirtal, şûr û tivingê rabûbû û hin  
însan,  
ehl, qewm û ziman binax kiribûn. Gotin hertim hem di xizmeta  
derewan  
hem jî di xizmeta rastiye de bû. Ez ji ders û tecrubeyên heyata xwe  
hîn  
bûbûm ko gotin diviya di xizmeta însên de bûya û birînên însên, ko  
în-  
san çu carê bêbirîn nedibû, bicebiranda. Heke hemû umrê huner-  
mendekî gotinê bikaribûya bi gotinên xwe birînên insanekî, bi tenê  
în-  
sanekî jî sax bikira, hingê gotin û xwediyê gotinê biserketî bûn. Bi  
min  
welê dihat ko li welatê me ko herkes li dijî hevûdu bû û qulipîbû ser  
we-  
latekî kor û kerran ko kesî li wir ne dengê wicdan û merhemetê  
dibihîst  
û ne jî dudilî û sûzeniya li ser rû didît, kêmaniyeye zahf mezin a  
gotinê  
hebû û heke welat di wî halê kirêt de bû, tê de para kêmaniya  
gotinê za-  
hf bû. Heke gotin, gotina lihevhatî ya edebî, gotina sade, zelal û  
nerm ko  
çêla însên, serpehatiyên wî û her celeb haletên wî dikir, bi têra xwe  
hebûya hingê rewşa welêt jî dê cihê bûya. Heke xal û xwarzî, bira û  
birazî

li hember hevûdu radibûn, bi ya min, hinekî jî ji ber kemaniya gotinê bû,

gotina ko dikarîbû ew û dilê wan perwerde bikira, alîkariya wan bikira da

ko ew ji ders û tecrubeyên bav û kalan bêtir serwext bibûna û riyeke nû

bidana ber wan.

Guhdarno, gotin diviya.

Hem ji bo min, birînên min ên ko li ser rûyê mîn mîna pîneyekê dixuyan û yê ruhê min ko çu carê kesekî din nedidît û hem ji bo êş, azar,

hêvî, hest û bestên ko di nav beroşa kel lêhatî ya welêt de diçelqiyên.

Ji lewre min zorê dabû gotinê û her digot. Carek, du caran, sê caran, her li pey hev, dubare, ji nû ve. Min stranek lêdikir, piştî çendekê dîsan lê

vedigeriyam, dîsan lêdikir, disan lê vedigeriyam, hin gotinên wê, hin cimleyên wê diguherandin, li şaşî û çewtiyên xwe wardiqilîm, ew rast

dikirin û dîsan lêdikir û di dawiya dawîn de, di nav nivînên gemarî de,

213

destê min li ser gunikên min, min ji xwe, ji kesê xwe yê duwemîn dipirsî;

Biro, tiredîno, dîne gotinan, ez dîsan li stranê vegerim?

Di destpêkê de, çaxa ez xeşim bûm û min nikarîbû dengê gotinan baş

seh bikira, bi min welê dihat ko min gotin her dubare dikirin û tişteki nû

nedigot. Paşê, gotinan hînî min kirin ko ne welê bû, her cara ko gotin

dubare dibû, kûrahiyên gotinê dihatin pêş, sir û siherên wê xwe diyar

dikirin, aheng û awaza gotinê bêtir dikemilî û dineqîşî, giranî û zêde-  
hiyên gotinê, mîna qaşilê porteqalê yan qalikê gwîz, jê diçûn û bi  
tenê ce-  
whera gotinê, kakilê wê dima, – cewher û kakilê ko tê de ders û  
tecrubeyên herî pêwist ên însanî, rastiyên herî rast ên însên ko  
hertim  
xwe vedişartin û deng û pêjnên herî pêwist ên dil û ruhê însên  
hebûn... Ji  
wan gotinên Apê Xelef, Mam Sefo, feqe û seydayên Medresa Sor,  
qewal,  
feqîr, pîr û şêxên êzidî, dengbêjên botî, kitabxana Mam Sefo û  
hicreyên  
Medresa Sor fêr bûbûm ko gotin ji bo gotinê bû, bêyî ko tişteki  
qezenc  
bike yan jî winda bike, bêyî ko berdevkiya kesekî bike û ji bilî însên,  
got-  
inê têxe xizmeta tişteki din, gotin, ji bo gotina bûyer û serpehatiyan,  
çêl  
û salixdanê bû. Çaxê cewher derdiket ronahiyê, wê bi bedewî û  
ronahiya  
xwe hawîrdor jî dixemiland û wan bi hev re çîrokeke nû ko hem ji  
ce-  
wherê hem ji ronahiya hawîrdorên cewherê dihate pê, diafirîn.  
Min li feqîrxana xwe kitabxaneyêke biçûk, ji zimanên erebî, farisî,  
os-  
manî û kurdî ko min pê dizanîbû û ji zimanên latîni, îtalî, ermenî,  
frensewî ko min pê nizanîbû, lê li sûretên wan dinihêrî, anibû pê.  
Yezdanê dilovan jê razî be, Mam Sefo rê dabû ko min hin kitabên  
kitabx-  
ana wî, mîna kitabên Keso, Naso ko li ber dilê min zahf ezîz bûn û  
ez pê  
mezin bûbûm, hilda û bianiya malê. Min ji Medresa Sor jî, tevî  
Quranê,

çend kitabên qalind anîbûn û Têlî jî, bi dizîka, ji medresa qesrê,  
şîrên  
Siyahpûş, dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Şêxê  
Senan a Feqiyê Teyran jî tê de, çend cîld anîbûn û dabûn min. Li  
mala  
neçar ko jê bîhneke giran a xwîdan û gemariyê dihat, niha gotinên  
devkî  
û niviskî û sûret û dîmenên ko ji gotinan bêpar bûn, lê min gotin li  
wan  
zêde fikir, li bin guhê hev diketin. Niha li malê, mîna daristaneke  
darên  
tûyê, daristaneke dengan hatibû pê ko tê de her darekê xwediyê  
dengê  
xas ê însanî û di her dengê xas jî xwediyê her texlîd awazên însanî  
bû.  
Deng, pêjn, olan, qîrîn, nalîn, girîn, lava, bêdengî ko xwediyê  
dengê  
xas bû, hemû li wir, di nav daristanê de, li teniştê min bûn. Ez  
diketim  
nav daristanê, li wir pêrgî dengan, însanan, serpêhatiyan, haletên  
însanî,  
hest, hîs û daxwazên qederen cihê, awazên têkel dihatim, hin ji wan  
214  
dikenîyan, hin digirîyan, hinan, mîna min bêrawest digot, hin jî  
bêdeng  
dipojinîn, şer û pevçûn dihatin pê, beden digihîştin hevûdu, dil hil-  
davêtin, mal bar dibûn, koçên welatê xerîbiyê li dar diketin û ez di  
daris-  
tanê de winda dibûm. Gotina xelkê ko ji bo min digotin, rast, lê kê  
bû,  
ji ber ko ne bi tenê ez, lê ruhê min jî dîn bû û ez di nav daristana  
deng û  
gotinan de, di ser cewherên gotinan re dipengizîm û digihîştim



kûrahiyên ruhê xwe yê dîn û hîn bêtir har dibûm.  
Çaxa ez har dibûm, min xwe davêt kuçe û kolanan, zinar û çïyan, da  
ko  
ruhê min dîsan haş bûya. Çaxa ez li gotinan hûr dibûm û wan jî ruhê  
min  
har fikir, min xwe davêt bextê çend cîhen ko ji bo min miqedes bûn;  
tir-  
ba Melayê Cizîrî ko li tenîşt Medresa Sor, di bin mizgeftê de, li nik  
çend  
tirbeyên din ên ewliya û xoceyan de bû; mizgeft û tirba Nebî Nûh  
ko ji  
Medresa Sor bi qasî bîskekê bi dûr bû; tirbeyên Mem û Zînê ko di  
zêzemînên xaniyekî xirbe de veşartî bûn, dara qedîm a tûyê ko di  
xortiya  
min de riyên dûr ên nasîn û kemilandinê nîşanî min dabû û gopikên  
çiyayê Cûdiyê ko keştiya Nebî Nûh hatibû û lê venîştibû. Piştî ko  
gotin  
li min dihatin xezebê û gunik li bedena min sor dibûn, di nîvê şevan  
an  
keleberbangên sibehan de, mîna keleşekî, bi hêdîka, min xwe davêt  
derve, diçûm nik tirba Nebî Nûh ko bi qasî çar, pênc mîtroyan dirêj  
bû,  
an diçûm nik Melayê xwe yê xwediye rêzên heybetpilingê ko di nav  
cawekî kesk î hevrêşimî de dinivist, an diçûm şikefta ko Mem û Zîn,  
ev  
herdu evîndarên bextreş ko ji bilî goristanê negihîştin hevûdu, li  
tenîşt  
hevûdu dinivîyan, li ber kêlên wan rûdiniştim, heşê min li ser  
lihevanîna  
gotinên ko li min hatibûn xezebê, min li dengê bêdengiya tirbeyên  
wan  
guhdarî fikir, heta ko ez li tenîşt tirbeyên wan, mîna kurekî wan,  
di

ruhê min de olana dengan, biçûma xew.

Lê belê di nav wan hemû dengan de du dengên din hebûn ko ez ne bêyî

wan dibûm ne jî bi wan. Belê dengê Gulîzerê ko êdî heya û fediya wê re-

viyabû û bi çêr û nifirê dest pê dikir û bi nalîn û hîrehîrê kuta dihat û

dengê Armê ko hertim bi naz û tîz, bi mizemiz û vizeviz û belengazî bû.

Gava Heme, birayê Gulîzerê ko bûbû alîmekî jixwerazî, komeke dîndar

li dora xwe civandibû û bi navê »hedef« tevgerake dînî girêdabû û li hemû

navçeyên welêt çerx dibû û ji nimêj û niyazê bêtir bi karê çêr û paşgo-

tiniya xelkê radibû, ji bo kar û şixulên xwe diçû derine dûr, hingê Gulîzera ko mîna mehîneke heşerî jê hîrehîr radibû, dilezand û dihate

mala min, yanî mala xwe ya berê. Ewê digot, belqityo, ev çi hal e, ev çi

kirêtî ye, ev çi gemar e û dest bi nifirên xwe dikirin û ji bo nîşandana aqil

215

û feraseta xwe, qala tiştên hîç û pûç ko hîç bala min nedikêşandin, dikirin, lê min ne xem bû, herçî ez bûm, min jî memikên wê difirkandin,

bi lêvên xwe ko jê girêz diçû, gerdena wê ya gewher radimûsand û geh

stran, geh şîr, geh serbest, geh biwezîn, jê re rêz û heyranok dixwendin.

Ji bilî belqityo û korê pîsê heram, ewê çend navên din ên balkêş li min

kiribûn; singo, misaso û mîrkuto. Sing, misas û mîrkutê ko di heyata  
wê  
û mala şivanan de hertim girîng bûn, niha xwe gîhandibûn bedena  
wê û  
jê deng radikirin.  
Heyra, ji nav van navan, mîrkut, yê herî baş e, min digotê û mîna  
mîrkutek ko dan dihenciqand, dioriyam;  
Mîrkuto, lo mîrkuto  
Dikute, lo mîrkuto  
Mîna darkutkuto  
Her dikuto, her dikuto!..  
Herçî Armê bû, bedena wê jar, dilê wê bikul, ruhê wê ziravbihîstiyar  
bû.  
Heke ez bibêjim we ko ew xweşik bû, derew e, naxêr, ew ne xweşik  
bû û  
heke hûn li rê pêrgî wê bihatana, ez êmin im, we dê lê nenihêrta.  
Heşê wê  
jî, tevî ko ew keça Mam Sefo û Senemxanê bû, ne ewçend zêde bû,  
jîrî û  
jêhatîbûn jê bi dûr bûn. Wê ne dinya nas dikir, ne civat û bajarê ko  
tê de  
dijiya û ne jî der û dorên xwe û hîç carekê ev yekên hanê meraq jî  
nedikir.  
Lê dengê wê yê zirav û narîn, bal û nêrîna wê ya nazik, gav û tevgera  
wê  
ya giran, bedewiyeke nediyar didayê. Tevî ko hertim bîhna wê teng  
bû,  
hertim naz û tîz dikir, ji bervajiyê Gulîzerê, ewê çu carê dengê xwe  
bilind  
nedikir û jê hîrehîr ranedibû. Dilê wê tenik bû û hem ji min hem ji  
în-  
sanên doralîyên xwe hez dikir û hertim dil dikir alîkarî bike. Ewê  
behsa

qumçikên fîstanên xwe, qewraşên ko xwîn li wan ketibû, şorba ko kelê

bû, pîrhevoka ko ewê di teniştâ nivînan de dîtibû, laleyên ko pelên xwe

yên sor vedikirin û mûyên bin çengên xwe ko ewê nikarîbû, bi tamamî,

jêkira û jê bîhna xwîdanê dihat, dikir.

Heyra, bîhna xwîdanê, mîna bîhna misk û emberê ye, min digotê û destê xwe davêt bin çengê wê, heke ji te jî mîna min, her celeb bîhn bi-

hata, te dê çi bikira?

Lê tevî henek û qeşmeriyên min, ew nedikeniya û ji nexweşiya diya xwe

û vir ve, ewê lîstikên me yên zarotiyê ko di zêrzemînên mala wan de, pi-

raniya caran bi alîkariya bilo dihatin pê, ji bîr kiribûn. Gava em li mala

216

min, an li mala wan, li mezelê wê û di bin xaç, sûretên Îsa Mesîh, find û

qendîlan de, bi tena serê xwe bûn, ewê carina bi tenê tiştêkî dikir, radibû

ser piyan, dihate teniştâ min, hinekî ji paşve, li milê min ê rastê disekinî,

fîstanê xwe ji xwe dikir û memikên xwe yên biçûk nîşanî min dida.

Lê

helbet min, bi wî terhî, memik nedidîtin, ji ber ko çavê min ê rastê ne-

didît.

Koro, lê binihêre, ewê digot, lê gava ez hinekî dizivîrîm, ew jî, hingê biken, hinekî din dizivîrî da ko ez memikan nebînim.

Lê sîh û sê çîrokên hirçê hene û hemû li ser hurmiyê ne. Di heyata min

a duwemîn de ko di navbera Gulîzerê û Armê de derbas dibû, sîh û sê  
çîroken min hebûn û hemû li ser memikan bûn. Lîstika wê ya tekane bêfeyde bû, min xwe dihîgandê û bêyî ko zerarekê bidimê, min parsûyên  
wê diguvişandin û memikên biçûk difirkandin.  
Lê belê gilî û gazinên wan ên zewacê, vitevit û belangaziyên wan ên dawet û dîlanê û çêr û qîrînên Gulîzerê roj bi roj zêde dibûn. Carina, ji  
bo ko ez jî bersivek bidim, min digot,  
Heyra, ez dengbêj im, ez stran û şîran lêdikim, ji min bihewin...  
Hingê Gulîzerê bi dengêkî ko lê dihat, diqîriya ser min;  
Ez guyê ometê têxim nav dengbêjî û şîrên te!  
Armê gotinên weha bi kar nedianîn, lê ewê jî stûyê xwe xwar dikir, bi  
lava, li min dinihêrî û digote,  
Ma deng û şîrê heyata te bi rê xe û zike te têr bike? Ma dengbêjên din  
ko xwedî zar û zêç in, di wextên xwe yên vala de, stran û şîran lênakin?  
Ma min, rebenê Xwedê û dînê gotinan ko hemû umrê xwe dabû got-  
inê, dikarîbû çî bigota û bi çî celeb gotinan rewşê bi wan bida fahm kirin?  
Lê hingê, di wan rojan de ko tevnên Armê û Gulîzerê li dora min dihate  
ristin û cîh li min teng dikir û êdî ez hêdî hêdî têgihîştibûm ko eşq, henek  
û kêf jî çu carê bêyî stirî nedibû û evîn bêyî êş û azar nedikemilî, sefera  
min a welatê Hekaran û gundên keldanan hate pê.  
Dengê Stêrê hingê, di wê sefera min a çiyayên Hekaran de, cara yekemîn

kete guhê min, lê ne mîna gotin û kite, mixabin mîna nalîneke kûr.  
Cizîr dîsan bûbû ardûya dadayî ko beroş li serê hatibûn hilawestî  
û  
hatin û çûyin, gotin û qise, derew û buhtan yekcar zêde bûbûn.  
Mîna ko  
destekî nediyar, ji nişka ve, perdeyeke reş a kîn û nefretê bikêşîne  
ser ba-  
jêr, welê bi tenê çêr, nifir, fort, gotinên neçê yên dijminahî û  
berberiyê li  
bajêr digeriya. Bajarê ko hewl dabû da ko bibe navendeke îlim û  
îrfanê,  
217  
biratî û dostiya ehl, ziman û olan û zewaca di navbera misilman û  
filehan  
de perû dikir, qulipîbû ser dûjehekê ko jê agir radibû. Xelkê ko di  
nav  
agirê dûjehê de bû, bêyî ko dûjehê bibîne û bîr bi agirê dûjehê bibe,  
qala  
axret, bihîşt, bexçeyên bihîştê dikir. Dewr û dewran bi mij û dûman  
bû  
û guran ji mij û dûmanê hez dikirin; bajar bûbû warê kevnepereştan  
ko  
dînê îslamê li ser dijminahiya ehlê file şerh dikirin û kuştina filehan  
mî-  
na sewab, heta mîna ferz nîşan didan. Medresa Sor ko warê îlîm û  
zaninê  
bû, niha bûbû warê pistepist û gotinên kirêt, meclîs û dîwanên  
rîhspiyan  
bûbûn warê fitne û fesadiya filehan, qahwe û dûkan bûbû warê  
kambax  
ê rik û nefretê. Ez nizanim ka ew hemû ji kû, welê bi carekê, peyda  
bûbûn, lê her celeb xoce, şêx, seyid, mele, alîm û şagirtên dînî, her  
yek ji

derekê hatibû û li Cizîrê civiyabûn û tevgerên nû yê dînî ava kiribûn.

Hemeyê fistûj ko êdî mîna Hemeyê Malmîran dihate bi nav kirin, tevgereke xurt, mîna tevgera Hesên Sebehê faris ko bi tehdît û kuştinê jî

radibû, ava kiribû û navê wê danîbû Hedef. Hedefa ko Heme û peyayên

wî qal dikirin, belavkirina dînê îslamê û qirkirina filehan bû. Bûrayê Heme, Kemaleddînê cîrcîrok ko mîna Heme dirêj, zirav û jar bû û dengê

wî jî mîna qijikê tîz û bed bû, tevgereke din ava kiribû û navê Riya Rastî

lê kiribû. Yanî riya rastiya exret, dîn, îman û bihîştê ko ji dijminahiya kesên ko mîna wî nedifikirî û kuştina filehan derbas dibû. Xwedê Teala

çi esebiyet, kîn û nefretên dinyayê hebû, hemû xistibûn zikê wan û ji

lewre, ji ber esebiyet, rik û kînê, ew hertim mîna misasê dirêj û zirav bûn.

Mîna wan, hîn gelek tevger, meclîs û dîwan li welatê Cîzîra Botanê û

Hekaran hatibûn pê û li her derê mîrekiyê û welêt, ayet û hedîs li ser lêvên

wan, diqîriyan û digotin;

Kesên xêrê, naçin dêrê.

Ew li bazar, xan, hemam, aşxane, qahwexane, dûkan, mizgeft, gund,

şikeft, zozan, meclis û medresan digeriyan û geh bi pisepis, geh bi qîreqîr,

digotin;

Hespê kule, seyê tûle, mêrê file lê mebe ewle...

Ev hemû tişt ji bo keldanan bûn û kesên ko kuştina keldanan dixwest-

in, bi çavsorî, paşgotinî, xirecir û qîreqîreke bêpayan, dengê ehlê  
aklî  
selîm û xwedî wicdan birîbû. Her kesê ko mîna wan nefikiriya, mîna  
wan  
tevger girênedana, li gora wan, xayînê dîn û îmanê, sûtalê ehleq û  
pergalê  
bû. Herkes diviya li wan guhdarî bikira, li gora wan gav bavêta,  
serekatiya  
wan qebûl bikira û stûyê xwe li ber wan xwar bikira. Dîsan hukmê  
şûr û  
tingê li dar bû û ji Mîr pê ve, hew kesekî din dikarîbû rê lê bigirta.  
Bayê

218

xezebê dîsan rabûbû, tofaneke nû li rê bû û pêla ko baskên xwe dişî-  
dandin, bi hemû hêza xwe dihat.  
Herçiqas çêla filehan dibû jî, armanc û hedef keldan, nemaze  
keldanên  
nastûrî bûn. Kesî ji bo ermenên heremê çu tişt nedigot û nedikir, lê  
çaxa  
qal dihate ser keldanan, agir ji devê herkesî dibarî. Hin şêx û seyidan  
bi  
qîreqîr digotin;  
Ew filehên penceperan! Ew kî ko li hember dîne îslamê rabûne?  
Xwîna  
wan helal, kuştina wan sewab e!..  
Hin kesên xwenda, mîna Heme û Kemaledîn jî bi îzehetên dirêj  
didan  
zanîn ko keldan, striyê çavê welatê kurdan bûn, di nav kurdên ezîz  
ên  
misilmanan de li pey dewleteke fileh bûn û wan bi pozbilindî û  
rabûna  
xwe, xencer li dilê kurdan û misilmanan xistibû.



Herçî beg û giregirên ko di esasê xwe de li pey erd û heyînên  
keldanan  
bûn, wan jî li gora xwe mesele diyar dikir û digotin;  
Keldan bitir bûne, êdî ne bac didin, ne jî li begên xwe guhdarî dikin,  
bi  
wan welê ye ko ew jî tişteki ne. Wan ders divê, ew divê di xwîna  
xwe de  
bêtin gevizandin.  
Gotin bêrawest dihatin gerandin, lê xwediyê gotina dawîn Mîr û  
qesra  
ko li teniştî çemê Dîcleyê bû, ko mîna nobedareke qedîm a hemû  
tarîxa  
navçê dixuya. Herkes bi meraq, li hêviya biryara Mîr bû. Begên  
Hekaran  
Nûrîlah û Derwêş alîkarî ji Mîr xwestibûn da ko wan bi hev re êrîş  
bibi-  
ra ser dever û gundên keldanan û kevir li ser kevir nehîştina, lê Mîr  
nedilezand û di biryara xwe de giran bû. Dîsan civîn û civat  
digeriyan,  
beg û giregir dihatin û diçûn û ji her serî gotinek derdiket. Qendîl û  
meşaleyên qesrê heta ber destê sibehan pêketî bûn, nobedarên  
nîşanger,  
tivingên wan ên zîvhêlî li milê wan, li dora kelehê û li ser bircan  
diçûn û  
dihatin, berî ko tav li wan hilwere û kesekî wan bibîne, qasid bi  
dizîka  
diketin qesrê û jê derdiketin. Herkesî dizanîbû ko biryar ê, mîna  
hemû  
biryarên girîng, di berbangeke nû ya sibehê de bihata diyar kirin.  
Ji  
lewre, li ber destê spêdan, hawîrdor bêdeng bû, tevî ko herkes  
hişyar bû,

însan bêlebat, bêtevger, li hêviya xeberekê bûn. Dinya zahf germ  
bû,  
havînê tîna xwe bera dile axê dabû û xelk li ser banan, li ser textan  
diniviyân û li ber destê sibehan, di nav nivînên xwe de, li rijandina  
stêran  
û li tîrêjên yekemîn ên tavê ko li pey çiyayê Cûdiyê serî hildadan,  
dini-  
hêrtin û guhê xwe bel dikirin da ko xebera li rê bibihîsin.  
Bi tenê di wan demên kurt ên destpêka rojeke nû de, çaxa stêr  
diçun  
ava û tîrêj serî hildidan, hawîrdor ji kurtepista bêpayan bi dûr bû û  
di nav  
219  
bêdengiyêke kûr de ko bêdengiya mirinê dianî bîra însên, ber bi  
rojeke  
nû diçû. Hingê, bi tenê hingê, berî ko cîrcîrok û qîjqîjok dest bi zirt  
û for-  
tan bikin, ehlê bajêr pêrgî rastiya xwe û heyata xwe ya nediyar,  
pêrgî tirs,  
xof, wicdan û merhemata ko hatibû veşartin, dikir. Wan berbangên  
ro-  
jên germ ên havînê, destpêka havîneke din ko bi qasî wan spêdan  
bêdeng  
bû, dianî bîra min; rojên êrîşa li dijî Seîd Begê û keleha wî. Hingê jî  
bê-  
dengiyêke bêpayan û ecêb civat û bajar vegirtibû, dar û dahl, zevî û  
devî,  
newal û gelî, însan û teyr, gund û bajar bêdeng bûn, hukmê tirs û  
xofa bê-  
deng û şûr û tivinga bideng li dar bû. Bi min welê dihat ko çaxa bira  
li bi-  
ra, cîran li cîran dihate xezebê, bêdengiyê jî perdeya xwe ya reş  
radikêşand

ser hawîrdor. Lê îcar bi tenê di destê spêdan de.  
Min ji Yezdanê pak hêvî hebû ko dewr û dewran dubare nebûya,  
rojên  
Seîd Begê bi şûnde venegeriyana û Mîr bi biryara xwe dewr û  
dewranên  
tirs û xofê venejanda. Lê mixabin, di taştêyeke sibeheke çîk î ronî  
de, mî-  
na cara berê, Mam Sefo ko yekcar ketibû, vegeriya malê, hate nik  
me,  
min û Migo ko li kitabxanê li hêviya wî bûn, bi girî, bi dengekî  
ewçend  
sext ko min hîç nebihîstibû, kitabên Tewrat, Zebûr û Încîla Lûqa li  
ber  
wî, xebera nû gîhande me; her çî kesê ko li hember gotina Mîr  
rabûya, di-  
viya bi sertî bihata cezakirin û ji lewre Mîr ê êrîş bibira ser keldanan.  
Ne  
kêm, ne zêde, wext, ji nû ve dubare dibû û ji ber ko min wexta berê  
û bûy-  
erên qewimîn, bi kitekit, di şevên borî de gotibû we, ez jî niha mîna  
wex-  
ta teres nekim û gotina xwe dîsan nebêjim û ne çêla halê Mam Sefo  
bikim, ne jî bûyerên ko li pey biryarê hatin pê.  
Ji nû ve tevgereke boş a eskerî dest pê kir, şûr ji kalan hate kêşandin,  
xencer tûj bûn, berik ketin devê lûleyan û êrîşeke xedar, ji çend  
milan, si-  
war û peya, tevî duwa, ayet û hedîsên dîndaran, bi quwetên eskerî  
yên  
Cizîra Botan û Hekaran, ber bi çiyayên keldanan rijîya.  
Piştî çûyina Mîr û hêzên wî yên çekdar, bajar dîsan kete halê xwe yê  
berê ko heyateke rojane, bêyî çu armanc û hedefên mezin  
dimeşand. Ew

deng û qîreqîrên ko bajar vegirtibûn, bi sefera Mîr, hate birîn û  
xwedyê

deng û qîreqîran jî tevî hêzên çekdar, berê xwe dan dijminên dîn û  
îmanê. Piştî biryar û sefera Mîr, êdî çu kesekî ko bikaribûya tişteke  
bikira,

nîn bû, – heke em osmaniyan nehesibînin, lê mîna ko ew jî bi  
bûyeran

qayil bin, tevî ko haya wan ji şer û seferê hebû û wîlayeta Mûsil,  
Diyarbakir û Wanê gelekî nêzîk bû û esker û sîxûrên wan li her derê  
welêt

digeriyan, deng ji wan dernediket. Hema çî bigire bajar vala bûbû,  
Mam

Sefo herdu zarokên xwe Migo û Armê hildabû û bi qesta ziyaretê  
dîsan

220

çûbû welatê Wanê, Heme jî xweha xwe hildabû, tevî jin û zarokên  
xwe,

çûbû nik şêx û seyidên Şemzînanê, da ko nêzîkî şer û pevçûnê bûya.  
Yezdanşêr ko êdi bûbû peyayê herî girîng ê Mîr, pê re çûbû û Têlî jî  
çûbû

welatê Xerza, Xelat û Norşînanê, nik şêx û medreseyan wan.

Herçî ez bûm, tevî ko Mam Sefo dil kiribû ez bi wan re biçûma û  
Yezdînşêr xeber şandibû ko ez pê re bûma, ez neçûm çu deverê û li  
bajêr

mam û min xwe ji her carê bêtir da ser gotinê. Dinya germ û  
hawîrdor

ronî bû. Pirî caran, tevî ko lingê min ê rastê, piştî sefera kelekê ya  
çemê

Dîcleyê, hinekî dikuliya, ez pêşî siwar, paşê peya, hildikişiyam bilin-  
dahiyên çiyayê Cûdiyê, li wir, li ber devê şifektekê, ko hemû welatê  
Cîzîra

Botanê jê mîna lewheyêke kitabxana Mam Sefo dixuya, li ser  
tehtekî,

kulavê ko ji Apê Xelef ji min re mîrat mabû, di bin min de, rûdiniştim,  
min cixareyên xwe yê şevê dipêçandin û tevî heste û mewîj, hejîr,  
gûz û  
behîfen ko di bêrîken şalên min de bûn û min derxistibûn, datanîn  
pêşiya  
xwe, di bin xalîçeya rengîn û çirûsî ya stêran de, li axa xopan a  
xezebê ko  
li ber min raxistîbû, dinihêrî û li tofana Nûh, li tofanên ko li pey  
tofana  
nûh rabûbûn û li tofana ko di wan rojan de, di navbera neviyên Nebî  
Nûh de radibû, difikirîm. Pêçiyên destê min ê rastê li ser teyrê min  
ê taw-  
is ko di stûyê min de bû, geh bi qîrîn, geh bi awazeke nerm, min  
gotin li  
hev dianîn û distram. Gerçî gotin, yê min bûn, min ew di kûrahiyên  
ruhê xwe yê dîn û heşê xwe yê peregende de peyda dikirin û li hev  
siwar  
dikirin, lê belê di esasê xwe de, ew hemû gotinên qeder û  
serpêhatiyên  
xezeb û tofanên kevnare bûn. Carina bi min welê dihat ko min her  
got-  
inên nû, bi awazeke nû digotin, lê di derengê şevê de, gava ji bo  
kêşandi-  
na cixarê ez disekinîm, hingê min bîr dibir ko gotin, gotinên kevnare  
bûn  
ko beriya min jî bi hezaran caran hatibûn gotin. Carina jî bervajiyê  
wê,  
çaxa min gotinên ko min ji ders û tecrubeyên kevnare wergirtibûn  
û ji  
stran û serpêhatiyên berê jiber kiribûn, dubare dikirin, di kêliyên  
west û  
bîhnvedanê de, ez li xwe wardiqilîm ko di nav wan gotinên kevnare  
de

gotinên nû jî hebûn. Tarîxê her xwe dubare dîkir, lê heye ko bi kirasekî

nû, bi risandin û hûnandineke nû; gotinê her xwe dubare dîkir, lê heye

ko bi hîs, pêjn, hest û bihîstiyarên nû. Qewimîn û rastiyan nû gotinên nû

li qal, çêl û qiseyan kevnare zêde dîkirin, mîna stêran ko li ser serê min

dilîstin, diçirûsîn, dixuricîn û dirijyan. Carina, gava stêreke zer a ronî ji

milekî asimên ber bi milekî din dixuricî û diheliya, ez jî li qedera însên,

milet, ziman û medeniyetan difikirîm. Însan û millet, welat û medeniyet

jî mîna stêran bûn; hildibûn, dixemilîn, diçirûsîn, diçirişîn, bi şewqa xwe

221

ronî direşandin û bi dû re jî, diheliyan û wînda dibûn. Lîstikek ko her şev

dubare dibû û lîstika abadîn a însan û însaniyetê dianî bîra min.

Xeber û nûçeyên êrîş û şer her roj digihîştin bajêr, lê belê heta ko min

netîceyan êrîş û şer bi çavê xwe nedîtin, min bi wan xeberan bawer nekir.

Piştî sefera Mîr, em bibêjin bi qasî mehek, mehek û nivê bi dû çûyina

Mîr û çekdarên wî re, keyayê Mam Sefo, di danê êvarekê de, çaxa min

hazirîya xwe û çûyina çiyayê Cûdiyê dîkir, bi dizîka hate malê û xeberek

gîhande min; heke ji min bihata, Mam dil dîkir ko ez ber bi deverên şer,

Tiyarî û Aşîtayê biçûma û heye ko min bikaribûya malbatek ko li wir,  
di  
nav agirê şer de mabû, ji agir xelas bikira.  
Guhdarên delal, heke bête bîra we, min di şevên me yên borî de, ji  
we  
re behsa gera me ya Mûsil, Bexda û Babîlê, rêwîtiya me ya kelekê,  
xwediyê kelekê Apê Yaqûb, kurê wî Bedros û segê wan Gurzo kiribû.  
Malbata ko Mam Sefo dil dikir ko min bifilitanda, jin û zarokên Apê  
Yaqûb bûn. Apê Yaqûb û Bedros, ji agirê şer dûr, li Mûsilê bûn, lê  
belê  
malbat di nav êgir de mabû û ewî xeberek gîhandibû Mam Sefo ko  
li dûr,  
li welatê Wanê bû û jê alîkarî xwestibû. Mam Sefo, ew însanê ko  
hew  
dikaribû gotina xwe bigîhanda Mîr, jina xwe û hevalên xwe yên  
gerand-  
ina şixulên mîrekiyê, bi biryara dawîn a Mîr re, winda kiribûn, lê tevî  
şikestinê esalet û maxrûriyê terk nekiribû û xwe bêdeng spartibû  
deng û  
gotinên kitabên û êdî di warê şer û pevçûnê de ji destê wî çu tişt  
nedihat,  
xeberek veguhezandibû min da ko ez biçûma hawara malbatê. Li  
milekî  
min nikarîbû gotineke Mam bikira dudo, li milekî jî min nikarîbû  
çêyiya  
Apê Yaqûb û Bedros, ew însanên ko bi alîkariya min rabûbûn û bêyî  
ko  
çu tiştêkî bixwazin, heta Mûsilê bi me re hatibûn, ji bîr bikira û di  
ser de  
jî, min mîna her carê, îcar jî bûyer û qewimînên welatê Hekaran zahf  
meraq dikir û di cîh de min biryar da ko ez biçûma welatê Hekaran  
û

hingê min ji keya tika kir ko ew, ji bo dotira şevê, sê hespên bezê,  
sê tiv-  
ingên lûledirêj, sê têrên tijî xwarin, du kûzên tijî av, kîsekî biçûk tijî  
pere,  
kîsekî mezin tijî berik û du peyayên ne file, lê misilmanên pêbawer  
û  
nîşanger ko dikarîbûn berik ji qula derzî derbas bikirana, li hewşa  
malê  
hazir bikira û li hêviya min bisekiniya.  
Dotira rojê, çaxa şev daket û bêdengiya ko jixwe bajar vegirtibû, bi  
temamî perda xwe kêşand ser bajêr, şal û şapikên min ên rengîn ên  
botî  
li min, kulozê min ê fireh ê kesk û sor li serê min, teyrê min ê tawis  
li stûyê  
min, di kêleka çem re, bi gavên sivik û çapik, min da rê û çûm mala  
Mam  
Sefo. Keya daxwazên min bi cîh anîbûn û hesp, têr, kûz, peye, keya,  
du  
222  
qewraş, li hewşê, li benda min bûn. Êdî gotin nediviya, min silav li  
hevalên xwe yê rêving kir, ew nasîn, tivingek çeprast avêt milê  
xwe, rext  
girêda, li hespê ko keya ji bo min amade kiribû siwar bûm, ji yê  
mayî  
xatir xwest û tevî hevriyên xwe û têr û kûzên xwe, bi rê ketim. Lê  
berî ko  
em ji hewşê derkevin, keya kîsên pere û berikan jî gîhande min û  
gote  
min;  
Gundê ko malbat tê de dijî, di navbera Tiyariye û Aşîta de, li bin  
geliyekî ye. Heye ko xelkê gund xwe spartibe şikeftan.  
Gundekî di navbera çiya û geliyan de... şixulê min ne hêsan bû, min  
ne



navê gund dizanîbû, ne jî bi misogerî cîhe gund, di nava şer û  
pevçûnê  
de, diviya ez lê bigeriyama û min bipirsiya, lê ne xem bû, heke tişteki  
neçê  
jî biqewimiya û xirabiyek jî bihata serê me, diviya ez biçûma. Me  
xwe bi  
hêdîka berda hembêza şeva germ û ronî ya wextekî şer û pevçûnê  
ko li  
hêviya me û rêwîtiya me bû. Mîna her şeva kambax ko bi bêdengî  
û wes-  
ta şer û pevçûnan rapêçayî bû û çu kesî nizanîbû ka li pey perda tarî  
ya  
şevê çî hebû, şeva me jî, tevî ronahî û lîstikên stêran, bêyom bû. Ne  
bayek  
hebû, ne jî hûnikahiyekê û hê di destpêka rêwîtiyê de, heye ko ji  
germê,  
yan ji xof û sawê, min xwîdan da û bi xwîdana li ser eniya xwe, min  
hes-  
pê xwe ber bi warên hûnik, warên ko ne bi xwîdanê, lê bi xwînê  
vedi-  
gevizîn, ajot. Gav bi gav, qonax bi qonax, me nêzîkî li welatê  
Hekaran,  
qata şer kir. Di her gava me, di her qonaxa ko me dibirî de, nîşan û  
alemetên şer dixuyan. Rê, xan, pir, bihur hemû girtîbûn û bi tenê,  
bi rê-  
dayina nobedarên çekdar, însan dikarîbû tê re derbas bûya.  
Hejmara kerî  
û naxiran kêmbû û ji her cîhê ko esker derbas bûbû, çal, kort û  
şopên  
lingên wan û simên hespên wan dixuyan. Gav bi gav hawîrdor  
asêtir,  
çûyin diwartir û xof û tirs bêtir dibû.

Ji ber bextê min ê çê eskeran ez nas dikirim û bi henekên xwe, rê didan  
ko em di riya xwe de biçûna. Çaxa em ketin nav çiyayên Hekaran,  
me bi-  
hîst ko şer bi serfirazî kuta bûbû, keldan têkçûbûn, patrîkê wan Mar  
Şemûn ko serekê wan ê civakî û ruhanî bû û malbata wî, tevî keşe û  
me-  
tranên navdar ên nastûriyan, kitab û mîratên wan ên dînî li ser piştta  
hesp,  
ker û bergîran, bazdabûn û çûbûn Mûsilê û hêzên Cizîra Botanê û  
Hekaran, bêyî zîrar û ziyaneke, ji çiyayên vedikêşiyayî. Tarîx dîsan  
dubare  
dibû, dîsan hêzên çekdar ên serfiraz welatekî şewitî li pey xwe  
hîştibûn û  
vedigeriyan û ez, çavê min ê kor dîsan bi jan û liyan, ber bi şewatê  
diçûm.  
Şewat rastiya min bû û ez îcar jî dîsan ber bi şewatê diçûm. Geh di  
bin ta-  
va sincîrî ko mîna topeke agirê dûjehê bû û geh di bin stêrên ko  
bêziman,  
223  
lê ez bawer im, matmayî li me, li însanên ko qira hevûdu dibirin,  
şahidî  
dikirin de, her gava ko me hîn bêtir nezîkî li dilê çiyayên Hekaran  
dikir,  
rastiya şer jî hîn bêtir li ber me xuyadibû. Herçend rê tengtir, însan  
û  
gund kêmtir, dar û dahl boştir, zinar û çiya asêtir, newal û gelê kûrtir  
dibûn, rastiya ko me didît jî ewçend kirêttir û hovtir dibû. Gotina ko  
berdevkên şer û cîrcîrok û qîjqîjokên dîn û îmanê, mîna hedîsekê  
her  
dubare dikirin, îcar rast bû; kevir li ser kevir nemabû. Dar, dahl, devî,

daristan şewitîbûn, pozê çıyan bi dû û dûmanê reş dikir, devê geliyan, da  
ko kesekî nikaribûya bireviya, bi dar û keviran hatibû tijî kirin, li serê newalan kozik hatibûn vedan. Çaxa em, bi hezar zehmetî, gihîştin bilin-  
dahiyên çıyan û kûrahiyên newal û geliyan, yanî dilê welatê Hekaran,  
warê bav û kalên keldanan, hingê min rastiya şer a bêzar û bêziman, bi  
hemû zelaliya ko şerekî dikare berpeş bike, dît. Gund hilweşiyabûn, hemû mal û xanî, tevî ka, kadîn û zexîrê, şewitîbûn, zevî, axa çandiniyê,  
bax û bexçeyên fêkî û sewzeyan, av, co, lîç, ger, bîr, bincan û nêrdewanên  
bendên avê ko keldanan ji bo avdana zevî, bax û bexçeyan lêkiribûn, kav-  
il bûbûn, dêr şewitî, dîwarên wan hilweşiyayî û xaç û zengilên wan ji-  
hevketî bûn. Ji hemû hawîrdor bîhneke giran a şewat, dû, dûman, xwîn,  
xwîdan û mirinê radibû, komên mêş, pêşî, moz û gêreyan viziniyeke bê-  
payan dianin pê, cendekên pez, dewar, hesp û bergîran peregende, li vir,  
li wir, li erdê vegivizîbûn û bi bîhnê difnikên însên dişewitandin, însanên  
mirî, li ber deriyên malan, li hundir, li ser ban û eywanan, di nav hevşo û  
kadînan, bax û bexçeyan, di bin quntarên çıyan de bi derbeyên tivingê  
yan yên şûr ketibûn. Zarok, kal, pîr, jin, mêr her celeb însanên ko di nav

xwînê de bûn, niha bûbûn para teyrên dirende ko xwediyê wan çiyayên  
bilind bûn û para keftar, çeqel, hirç, rûvî û gurên ko xwediyê newal,  
gelî,  
şikeft û bihurên welatê Tiyari û Aşîtayê ko navê xwe ji haş û aşiyê  
wer-  
girtibû, lê niha qulipîbû qata şer, bûn. Li der û dorên me, carina, ji  
dûr  
ve, hin însanên ko ji berika tivingê û fizîna şûr xelas bûbûn, li ber  
çavê me  
diketin, lê çaxa wan em didîtin, mîna ask, simore û kêwroşkên wan  
çiyay, baz didan û xwe di nav zinar û daran de vedişartin.  
Em gihîştibûn dilê welatê Hekaran ko niha bûbû welatê mirî û  
kuştîyan. Cendek, mirî û kuştîyan hîseke welê dianî pê ko ne ez ne  
jî ke-  
sekî din dikare bîne zimên. Bêhejmar mirî û kuştî li erdê bûn û êdî  
çu  
vegera wan nîn bû û heyatek ko jixwe di nav neçarî, bêkesî û  
nezaniyê de  
bû, bi vî terhî, bi tiving û şûrê rik û nefretê, bêyî şîn û tahziye, bêyî  
stran  
û dîlan, bêyî gor û veşartin, ji nişka ve, kuta dibû û di bin tava germ  
de,  
224  
mîna ava coyekê miçiqîbû. Hingê, di rewşeke wele de, ez têgihîştim  
ko  
însan li hember wê rastiya kirêt hîç ne tişteki bû. Di kûrahiyên zinar  
û  
çiya, dar û daristanên welatê ko ji dinyayê bi dûr bû, mirinê konê  
xwe  
vedabû û bêyî çu dengî, li hawîrdor ko bi tîren tavê dikizirî, olan  
dida. Li

wir, di nav geliyên kûr de, ji nişka ve, ez pêrgî rastiya axa xezebê ko  
ji  
sedan, heye ko ji hezaran salan û vir ve her qedera herême bû û  
hem min  
hem jî kesên beriya min hertim qal kiribûn, hatibûm. Lê belê rastî li  
ber  
min û hevriyên min, gav bi gav, her cara ko em hinekî din, di ser  
taht, zi-  
nar û newalên bêbinî re, bi alîkariya hespên me yê jêhatî, hîn bêtir  
dadiketin binê geliyan, kûrtir dibû. Agirê dûjehê bi daristanê ketibû  
û  
hişk û ter tevde şewitîbûn; serî jêbûbûn, mil, pî, ling, dest ji beden  
ve-  
qetiyabûn, çav derketibûn, bîvil, guh mîna libên tisbiyan li ser  
tehtan  
hatibûn raxistin. Dinya di nav tava germ de disincirî, lê ez, îcar  
dewsa  
xwîdanê, ji sermayê diricifim, دنیا bi ronahiya tavê diçirûsî, lê  
mîna ko  
perdeyeke reş ketibe ser çavê min ê sax jî, دنیا li ber min reş bûbû.  
Min ê çi bikira, ji kê, çawan malbata Apê Yaqûb bipirsiya? Bi hezaran  
însan ko daristana agir pêketî, dianîn pê, peregende, ketibûn û ez jî  
li pey  
dareke daristanê bûm. Heke ez biçûma û min ji kurdên misilman  
bipir-  
siya, hingê heye ko em jî bibûna darên daristanê. Herçî keldanên  
saxmayî  
bûn, ewana jî em kurd dihesibandin û berî ko em bigihên wan, ji  
tirsan,  
bazdidan û di nav zinar û taht, dar û dahlan de winda dibûn. Çi  
tişteki  
ko me bikaribûya bikira, nîn bû, bêgav, me rûyê xwe ji rastiya şer  
zivirand

û serê hespên xwe ber bi welatê Cizîra Botanê kir. Lê hingê gava em  
êdî  
dizivirîn, tişteki qewimî û li pey zincîreke zinaran segekî gurêx peyda  
bû  
û bi lez û bez dirêjî me kir. Peyayê teniştî min tivinga destê xwe rast  
kir  
da ko seg li erdê bigevizîne, lê min ew da sekinandin. Segên gurix  
ên ter-  
biyekirî, çu carê, bêyî şivan û bêyî pez, dirêjî însên nedikirin û li milê  
din,  
segê ko ber bi me baz dida, bi min xerîb nedihat. Çaxa seg nezîkî li  
me  
kir, min segê zahf gir, ji stûyê wî yê spî û qalind û ji tevgera wî ya  
xurt nasî;  
ew, Gurzo bû. Belê, Gurzoyê Apê Yaqûb ko di sefera me ya çem de  
bi me  
re bû û heyata me xelas kiribû. Welê dixuya ko piştî çendîn salan,  
ewî dis-  
an ez nasîbûm û loma ber bi me hatibû. Tafilê ez ji hesp peya bûm  
û ber  
bi Gurzo çûm.  
Gurzo, Gurzo, mîna ko ez bav û diya xwe bibînim, min bi qîrîn got.  
Gurzo xwe avête ser min, dest û rûyê min alast, ez hembêz kirim.  
Ez  
nizanim ka çawan û li kû, lê ew birîndar bû, stûyê wî û hêtê wî yê  
rastê bi  
xwîneke hişkbûyî sor dikir. Heye ko ji ber pîrbûnê bûya, lê ew  
maxrûrî û  
225  
nêrîna sert hew li ser rûyê wî û di tevgera wî de dixuya, ewî bi  
hêdîka  
kûzekûz dikir û destê min dalast. Min ji tûrekî nan derxist û dayê, lê  
ew

zahf birçi bû, mîna gurekî birçî ewî nan bi carekê xwar. Mîn dîsan dayê.

Gurzo, min digotê û destê xwe li ser serê wî digerand, Gurzo, çi bûye, çi

qewimiye, ev çi hal e? Çi bi serê we hat, çi bi serê mala Apê Yaqûb hat?

Min dil dikir ko ewî bersîva min bida, bi min re bipeyiviya, da ko min dest bi giriyê bikira û ez têra xwe bigiriyama. Lê ewî bi tenê, bi nalîn, li

min dinihêrî. Paşê, çaxa ew têt bû, ew rabû ser piyan, qama boça xwe rast

kir û ber bi zinarên ko ew jê hatibû, çû, lê piştî bi qasî sed, sed û pêncî ga-

van ew sekinî, serê xwe zivirand û li me nihêrî.

De, em bidin dû Gurzo, min ji hevriyên xwe re got û li hespê xwe siwar

bûm, ewî dil heye, me bibe cîhekî.

Heta ber devê zinaran em çûn, lê ji wir û pê de, me hew dikarîbûn bi

hespan biçûna. Gurzo di qelîşekên zinaran re ketibû nav bihureke teng û

li wir, li hêviya me sekinîbû. Em ji hespan peya bûn û me da pey Gurzo.

Bihur ko bi zinarên mîna kêrê tûj bû, ber bi jêr, ber bi geliyekî kûr dadiket. Piştî çendêke dirêj, bihur ji nişka ve xelas bû û dahleke şên dest

pê kir. Niha diviya em di dahlê, di riyeke zahf zirav a fetloke re derbas

bûna, kêr û xencer di destê me de, geh çavê me li der û doran, geh me

çiqil, pel û şaxên dahlê jêdikir û gav bi gav ber bi jêr dibûn. Bi dû dahlê

re, em pêrgî coyekê hatin û tê re bihurîn. Ez nizanim ka em çiqasî  
çûn, lê  
çaxa tav ji milê rojava hêdî hêdî, xwe li pey çiyayê veşart û êdi tîna  
xwe  
winda kir, em gihîştin binê geliyekî. Di devê gelî de, li ser zinarekî,  
di nav  
darên zahf qalind ên mazû de ko bi şax, pel û çiqilên xwe hawîrdor  
pêçabû, dîwarekî avahiyekê ko bi dêrekê dişibiya, xuyabû. Gurzo  
ber bi  
avahiyê lezand. Çaxa em nêzîkî avahiyê bûn û ji binê ve me lê nihêrî,  
hingê me ferq kir ko ew hilweşiyayî bû û jê bîhna şewat û dûmanê  
dihat.  
Banê avahiyê ko bi sitûnên textîn û bi axê lêbûbû, ketibû, dîwarên  
avahiyê ko bi kevirên şehkirî yên reş lebûbûn, ji her milê avahiyê  
hilweşiyabûn. Darên mazûyê mîna kulavekî şivanan ko şivên ji  
serma û  
pûkê diparast, xwe xwarî avahiyê kiribûn û ew vedişartin. Dinya hê  
jî  
ronî bû, lê tîrêj diçûn ava û ez hê jî nizanim ka tîrêjên tavê, di  
nîvroyan  
de jî xwe digîhandin avahiyê yan na, ji ber ko dar, pel, çiqil li ser hev  
si-  
war bûbûn û hewl dabûn ko avahî veşêrin. Lê heyhat, hewl û  
daxwaza  
daran jî bêfeyde bû, ev avahî jî hatibû şewitandin. Ji milê me çu derî  
yan  
pencereyeke avahiyê nedixuya. Me diviya bida pê Gurzo û  
hilkişiyana  
jor, ser zinar. Gurzo dabû pêş me û riya zirav ko di nav daran re diçû  
226  
avahiyê, nîşanî me dabû. Li ser zinar ko mîna meydanake biçûk,  
tehtekî



fireh bû, li milê rojhilatê avahiyê deriyekî biçûk û nizm hebû. Gerçî  
ji wî  
milî êdî ne hewce bû ko însan ji derî biketa hundir, ji ber ko dîwar  
hilweşiyabûn, lê dîsan jî, me serê xwe xwar kir û em ji deriyê ko ji  
kêlekê  
şewitîbû, ketin hundir. Bi ketina me ya hundir, bîhneke ecêb giran  
ko ez  
bawer im, ji ritûbet, rewa, bêhawayî, xwîn û gemarê hatibû pê,  
hema çî  
bigire nefes li min çikand. Çaxa min xwe da hev û li der û dora xwe  
ni-  
hêrî, ji min bi tenê axînek çû û ez li cîhê xwe tewirîm erdê û li ser  
totikan  
rûniştim. Em di nav dêrekê de bûn ko hemû têkberên wê şikestibûn,  
le-  
wheyên dîwaran şewitîbûn, cawên ko sitûnên dêrê rapêçabûn,  
sotîbûn,  
kitab û defter bûbûn xwelî û komir û bi tenê hin rûpelên nîvşewitî  
diyar  
dikir ko xwelî, ya rûpelan bû. Ê di ser van hemû tiştan de, dêr heta  
dêv,  
tijî cendek bû. Însan, zarokên kur û keç jî tê de, li ser hev, li teniştan  
hev,  
di nav xwînê de dinivîyan. Milê dawîn ê dêrê bi tamamî şewitîbû û  
cen-  
dekên wî milî jî bi tamamî sotîbûn, lê cendekên li der û dorên derî  
û li  
milê rojavayê dêrê, nesotî bûn. Gurzo ko beriya me ketibu dêrê, ji  
derî bi  
qasî deh gavan bi dûr, li dora çend cendekan sekinîbû û kûzekûz  
dikir.  
Niha min hemû tevgerên Gurzo fahm kiribûn, min destê xwe da

dîwarê hilweşiyayî û ez ji cîhê xwe rabûm, çûm nik Gurzo. Di nav  
cen-  
dekan de, çavê min li sê jinên ko li teniştê hevûdu, di nav xwînê de,  
raza-  
yî bûn, ket. Gurzo xwîna li ser rûyê jina pîr dalast. Biviya neviya, ev  
xan-  
im, bermaliya Apê Yaqûb bû û herduyên ko li herdu milên wê razayî  
bûn  
jî, keçên wan. Min difnên xwe girtin û ez xwarî ser cendekan bûm  
da ko  
ji nêzîk ve jin û keçên Apê Yaqûb ko çendîn caran min ji devê Apê  
Yaqûb  
û Bedros behsa wan bihîstibû, binihêrta. Lê hingê bi min welê hat  
ko  
cendekê xwe livand. Tafilê min bang hevriyên xwe ko li milê din  
ê dêrê  
bûn, kir. Çaxa ew jî hatin û em hersê bi hev re li cendekê hûr bûn,  
êdi çu  
şika me jê nema; keça ko li milê çepê yê diya xwe razabû, hê bi  
temamî  
can nedabû. Bi carekê min rahiştê, bi dîqet, me ew ji dêrê derxist û  
li ser  
teht dirêj kir. Her derê keçikê di nav xwînê de bû, min bi destmala  
xwe û  
xweziya me hersiyan rû û berçavên keçikê paqij kirin, dest û milên  
wê  
mist dan, koloz û piştê xwe ji xwe kirin û danîn bin serê wê û çaxa  
hevriyekî min daket binê gelî da ko li wir ji dar û textan paxêlekê li  
hev  
bîne da ko me keçik pê bibira û yê din jî vegeriya hundirê dêrê da  
ko bini-  
hêre ka kesekî din hê sax bû, ez jî li hêviya keçikê mam ko wê çavê  
xwe

vekira.

Keçik ciwan bû û tevî ko ew li ber mirinê bû, bedewî û xweşikahiyeke

227

zarîf, sade û spehî li ser rûyê wê yê zer dixuya. Bejna wê dirêj, bala wê zi-

rav, keziyên wê zer bûn. Birû û bijangên wê mîna ko bi qelemê hatibin

çêkirin, welê xweşik bûn. Dev û lêvên wê lihevhatî, difnên wê biçûk bûn.

Rûyê wê hinekî zirav bû û li ser rû ne êş û azar dixuya, ne jî keder û endîşe.

Bi tenê ew, çavgirtî, jixweveçûyî dinivist. Destekî min li ser destê wê,

destê min ê din jî li ser teyrê min ê tawis, çavê min jî mîna çavên wê girtî,

rûyê min ber bi tîrejên ko êdî nedixuyan, min bi navê Yezdanê dilovanê

xwediye erd û asimanan dua dikir ko keçik ji xewa bêveger hişyar bûya û

vegeriya. Ewê çavê xwe venekir, lê tişteki din kir û heye ko Yezdanê dilo-

van dengê min bihîst, ewê bi hêdîka xirexir kir.

Yezdanê dilovan keçikê ji xewê vegevine, vegevine, min, rondik li ser çavê min, gote û destê keçikê mist da.

Ez tenedigihîştim ka ewê çi digot, lê xirexireke zirav ji gewrî û lêvên wê

derdiket. Bedros navê xwehên xwe ji min û Migo re gotibû û ew di bîra

min de, ko bîr û heşê dengbêjekî bû, mabû.

Sarah, min bi hêdîka, li ber guhê wê got.

Lê jê deng derneket.

Ester, îcar min dîsan, destê wê di nav destê min de, min gotê.

Hingê jê deng hat û wê serê xwe hinekî livand.

Belê, keçik Ester bû, Estera ko bi dû re bû Stêr, Stêra umrê min ê bêçare, heyata min a kambax.

– Dawiya cildê yekem –

228

Ravek

Mîr Bedirxan: 1803 (Cizîra Botan)–1868 (Şam)

Tarîxa destpêka mîrîtiya Bedirxan: 1821

Bûyera keleha Dêrgulê ya Seîd Begê: 1837, gulan

Qetliyama Nastûriyên Hekarê: 1842

Serhildana Mîr Bedirxan: 1846, Şikestina serhildanê: 1847

Sirgûna Mîr Bedirxan û binemaliya wî: 1847

Jiyana penaberî ya Mîr Bedirxan li Xaniya, Girîtê: 1847-1858

Jiyana penaberî ya Mîr Bedirxan li Şamê: 1858-1868

Melayê Cizîrî: Şaîr, nivîskarê Dîwanê, 1570-1640

Feqiyê Teyran: Şaîr, nivîskarê Şêxê Sen'an, 1590-1660

Ehmedê Xanî: Şaîr, nivîskarê Mem û Zîn, Nûbihara Biçûkan, 1651-1707

Keso: Ksenefon, nivîskar, kumandar, nivîskarê Anabasis, Vegera Dehhezaran 426-354, Berî Mîladê

Maro: Publius V. Maro Virgilius, Şaîr, nivîskarê Aeneis'e, 70, Berî Mîladê-19, Piştî Mîladê

Naso: Publius O. Naso Ovidius, Şaîr, nivîskarê Tristia, 43, Berî Mîladê-17, Piştî Mîladê

Mayrîg (bi ermenkî): Dê, dayik

Hayrîg (bi ermenkî): Bav

Hayr, vortî, hokîn sûrp, astvadz (bi ermenkî): Bav, kur, ruhê pîroz, Xwedayê Abadîn

Park dîroç (bi ermenkî): Hemd, şikur ji Xwedê re

Dixa (bi ermenkî): Zarok

Baron (bi ermenkî): Beg

Varjabed (bi ermenkî): Mamoste

Aşxarh (bi ermenkî): Dinya

Saragan (bi ermenkî): Ayet, îlahî, lavij

Gaxant: Noel, sersal

Medresa Sor: Ji aliyê Mîr Şerefxan ko ji bapîrên Mîr Bedirxan bû, di sala 1508-an de, li Cizîrê, hatiye avakirin.

Mem, Zîn, Bekoyê Ewan: Qehremanên destana Memê Alan û yên kitaba E. Xanî Mem û Zîn.

229

\*\*

## HÊVÎ HER DEM HEYE

Hesen Huseyîn Denîz

HÊVÎ

HER DEM HEYE

Roman

Cihê Çapê : Çapxaneya Azadî

Dîroka Çapê: Tebax 2007

Ji Ber Pêşgotinê Ve

“Mirov bê serkeftin dikare bijî, lê bê hêvî nikare jiyana bike!”

Mirovê/a serkeftinê ji destê xwe birevîne, dikare careke din xwe komî ser hev bike û bi têkoşîn û berxwedaneke tê xwestin, serkeftina pêwîst bi dest xwe bixe, bes ku hêviya xwe winda neke. Lê ku hêviya xwe winda bike, ew careke din nikare serkeftinê jî bi dest xwe bixe. Heta dev jê berde ku serkeftinê bi dest xwe bixe, mayîna wî/wê ya di jiyana de bê wate dibe.

Di jiyana têkoşîna rizgariya gelê kurd de qasî serkeftinan binketin, qasî qahremantiyan tirsonekî, qasî berxwedanan xayintî û qasî vîna azadiyê teslîmkarî hat jiyandin. Li kêleka mirovên heta guleya xwe ya dawî şer kirin, mirovên bê teqandina guleyekê çeka xwe avêtin û revîyan; li kêleka mirovên tî, birçî, pêxwas û tazî li ber xwe dan,

mirovên li ser derfetan xwe dan jiyandin û rantxuriya nirxên têkoşînê kirin ne kêr hatin dîtin. Dema hinek gerîlan bi birîndarî diketin destê neyar û ew bi îşkenceyên herî wehşiyane qetil dikirin, hinekên xwe bi taseke şorbe difirotin neyar jî di binê cilika bênamûsî û xayintiyê de gule bi ser gelê xwe de direşandin.

Hinek li ser xaka Kurdistanê bûn xwediyê gorên nediyar; lê di dilê gelê xwe de weke kulîlkên azadiyê şîn hatin û di serhildanan de bûn hêz û wêra dilê gelê Kurd. Li kêleka vana hinekên xwedî gorên diyar, bi laneta gel hatin bi bîranîn û gel ew ji goristanên xwe qewitandin. Têkoşîna azadiya gelê kurd ji berxwedana li hemberî zilma koledariya Asûriyan destpê dike û heta roja me didome. Di roja me de zordariya dewleta Tirkiyê li ser gelê Kurd dimeşîne, di dîroka ti gelan de ewqasî bi yekalî, ewqasî bi bêmafî û ewqasî wehşiyane nehatiye meşandin. Gelekî ku nasname, çand û zimanê wê lê hatibe qedexekirin, ji têkoşîna liberxwedanê zêdetir dikare çi bike? Keç û xortên dev ji tevahiya jiyana xwe ya di binê sîbanê sazûmana desthilatdar de berdidin û li navsera çiyayên azad mil didin hev bi mafdariya ji vê mafxuriya sazûmana Tirkiyê têdikoşin û dîrokeke bi rûmet ji gelê xwe re û rûmetekê ji xwe re bi ked, xwîn, candayîn û têkoşîna xwe re dinivîsînin. Xwezî bi dilê van!

Di vê pirtûka weke ceribandinekê pêşkêş dikim de min xwest bînim ser ziman ku tevî her tiştî ji bo ghiştina azadiyê, dildariya jiyane û baweriya bi serkeftinê, hêvî herdem heye; ev hêvî wê gelê kurd bibe azadî û serkeftinê û gelê kurd deyndarê afiranderê vê hêviyê ye.

Di rojên min ev berga vê romanê bi dawî kir de agahiya jehrîkirina afiranderê vê hêviyê hat. Sedem û awayê dijminatîyê çî û çawa dibe bila bibe, ji bo her kurdekî, ji aliyê neyarê kurdan ve jehrîkirina

kurdekî di destê xwe de dîl girtiye, bi sedema rêbertiyê ji doza azadiya gelekî re dike, bi awayekî zanistî û sistematîk, tê wateya jehrîkirina giştiya netewa kurd. Peyama vê jehrîkirinê kuştina hêdî bi hêdî ya giştiya nijada kurd e. Di vê cîhana newekhev û sazûmana wê ya bêbext de para didin kurdan, an koletiya bê maf an mirina hêdî bi hêdî ye! Bê guman her kurdekî xwe mirov û xwedî rûmet dibîne pêwîst e li hemberî vê helwesta wehşiyane a sazûmana Tirkan qiyametê rake!

Bi vê sedemê ez vê pirtûka xwe ya parçeyek ji jiyana têkoşerên azadiyê ku di rewşa mirinê de jiyane diafirîne, di binê her şert û mercên zor û zahmet de hêviya xwe ya jiyane û serkeftinê winda nake, baweriya xwe ya bi têkoşinê, bi giyana hevaltî û nixên azadiyê ve her zindî digre, bi rêzdarî ji dil diyarî afirandêrê vê hêviyê dikim.

Bi silav û rêz.

Hesen Huseyîn Denîz

3.Adar.2007/03.30

Qendîl

Wê roj bê

Emê careke din dakevin

Deşt û bajar

Careke din emê hev bibînin

Di rojên azad de

Li hev binêrin

Di bûkên çavên hev de

Bîranînên xwe bînin ser ziman

Ji hev re û

Hesret û hezkirinên xwe

Yên di dil de mane  
Û nehatine ser ziman

YEK

Bi tûke tûka saetê re hat ser hişê xwe û çavên xwe ji hev vekirin. Derdor ewqas tarî bû ku tiştêk xuya nedikir. Destê xwe yê rastê dirêjî yê çepê kir ku lempeya saeta xwe pêxe û lê binêre ka saet çi ye? Lê destê wî hat valatîyê. Saet jê ketibû!

Destê xwe li erdê peland, li gorî tûke tûka bihîstîye bir û anî. Saet zû hat destê wî. Rahîştîyê û lempeya wê pêxist. Saet sisê û çarîkek ê nîvê şevê bû!

Hinekî fikirî û texmîn kir ku nêzîkê sê saetan e bê hiş maye. Saeta xwe berda bêrîka xwe. Dîsa li derdora xwe nêrî. Êdî çavên wî hinekî fêrî reşahîyê bibûn û baştir didîtin.

Bilindahîyeke spî li aliyê wî yê rastê, bilindahîyeke reş li aliyê wî yê çepê dirêj û bilind dibû. Ji aliyê rastê sermayeke dijwar, bi ser laşê wî de dihat û bêtir fikir ku bi êşa birîna xwe bihise.

Gelo li ku derê bû, ketibû cihekî çawa? Hişê xwe hinekî paş de bir. Li jora Gelî xwe avêtibû ser berfê û şemitandibû. Li hinek cihan ewqasî bi lez şemitîbû ku hindik mabû li tehtên di nava berfê re serê xwe derxistine bikeve û parçe parçe bibe. Bi vê tirsê çeka xwe ji stûyê xwe dadixist qûndax û jarjûra wê di berfê de diçikand ta ku leza wî dişkest û kêmbû. Berya were halê rawestîyê, çeka xwe dîsa bi stûyê xwe ve dadiliqand û şemitandina xwe didomand. Dihat bîra wî ku çend caran wiha bi hêdî û bi lez qedereke rê sitendibû. Lê hîn jî bawer nedikir ku çepera dijmin qetandibe. Cara dawî dema leza wî xurt bibû dîsa destê xwe avêtibû çeka xwe, ji bo ji stûyê xwe daxîne û bide ber xwe, pê leza xwe kêmbike; lê tam di wê bêhnê de wekî hinek ji jor ve bi milên wî bigrin û wî ber bi ezman ve



bikişînin ango wekî rêka berfê xelas be û di kevandeyekê re bifire, lingên wî ji ser berfê qut bibûn û laşê wî wekî guleyekê firiyabû valahiyê. Tenê dihat bîra wî ku serê wî li hişkahiyeke ketibû û êdî ji vê dinyê qut bibû.

Bin burhê wî yê çepê xuriya. Destê xwe avêtyê. Destê wî li şlahiyê ket û pê re janeke zirav da ser dilê wî. Nû têgihîşt ku serê xwe li tehtê daye û xwîn ji burhê wî hatiyê. Pê re êşa milê wî yê rastê jî serî rakir. Qeşaya li kêleka rastê, serma xwe wekî şûjînan di kuna birînê re derbasî nava dilê wî dikir. Destê xwe danî ser birîna xwe û heta êşa wê rawestiya dewisand. Dema berda, lêvkeniyeke bi jan hat ser lêvên wî û di ber xwe de got:

- “Bila canê hevalan sax be!”

Çûna hevalên xwe yek bi yek anî ber çavên xwe. Di bin gulebarînên dijmin de, berê xwe dabûn navsera Kêla Memê. Her ku bi jor ve hildikişyan, berên hûr û girs ji ber lingên wan radibûn û ber bi dolika şer têde çêbûye ve digindirîn. Bi dengê gindirîna beran xwe bi kêleka dolikê ve xwar dikir û her du destên xwe li ser serê xwe digihandin hev ku biparêze. Dema dengê gindirîna beran qut dibû dîsa rêka xwe didomand. Lê vê carê, hîn ji tingîniya berê ji tehtekê dipengizî ser tehteke din têgihîştibû ku wê belayek jê re çêbibe. Nikarîbû ji dolikê derketa û xwe ji ser rêka ber bida aliyekî, ji ber ku dijmin hîn gule wekî teyrokan dibarandin seranserîya dolê. Heta jê hat xwe bi milê çepê ve çemand û bi kêleka dolikê re kir yek. Her du destên xwe li ser serê xwe gihand hev û guh da tingîniya berê ji jor ve dihat. Her ku deng nêzîk dibû, dilê wî bi tirseke mezin lê dida. Di dilê xwe de digot:

- “Xuya ye ev bêhna dawî ye. Rokêta dijmin ez ne kuştim lê wê berê hevalan bikuje.”

Dema ku ber cara dawî ji ser tehta li jora wî pengizîbû û vingîniya bayê wê hatibû guhê wî wekî dilê wî jê re bêje; “Wê ev ber li te bikeve”, xwe bêtir çemandibû û ji ber xwe, her du çavên wî jî hatibûn qurmiçandin.

Dawî bi êşa li ser milê xwe yê rastê re her du çavên wî ji ber xwe ve vebibûn. Bi lez destê xwe avêtibû milê xwe yê ber lê ketiye û şilahiyeke germ hatibû destê wî. Milê xwe yê birîndarbûyî rakir û danî ku bizanîbe şikestiye yan na. Janeke zirav dijawariya xwe heta nava dilê wî dirêj kiribû û rûyê wî qermiçandibû. Destê xwe berdabû ber xwe û di ber xwe de gotibû:

- “Ji ya xerab xerabtir jî heye. Ya baş ez rêka xwe bidomînim. Êdî di ku re zirav be, wê di wir re biqete. Ji xwe vê gavê ez mirî têm hesabandin. Ger ez bifilitim, ev, fêde ye. Na ku dijmin bi ser min vebe, bê kuştin, ez ji vê dinyê naçim.”

Belê, biryara xwe wiha dabû û bi qûnkişkê di dolikê re, xwe gav bi gav herikandibû. Ji cihê lê birindar bûye, bi xwekaşkirineke zêdeyî du saetan ghiştibû ber zeviya berfê. Laşê wî ji xwêhdanê şil û pil bibû. Lêvên wî ziwa bibûn û êdî xwezî di devê wî de nemabû ku biçe xwarê.

Li ber keviya berfê bêhneke kûr vedabû, heta ku xwêhdana wî lê cemidîbû û bi jana birînên xwe hisiyabû. Di vê navberê de heta diranên wî qerisîbûn, têr befir jî xwaribû. Dema dîtibû tava heyvê ji navsera zinaran dirêjî ser keviya berfê dibe, nû hişê wî hatibû serê wî ku hîn di nivê çepera dijmin de ye û pêwîst e çeperê biqetîne! Bi hewildaneke zahmet laşê xwe avêtibû ser keviya berfê, çeka xwe bi stûyê xwe ve daliqandibû û dest bi şemitandinê kiribû.

Ecêb e ku wê behnê, Deriyê Dawetiyan ê li Başûrê Kurdistanê hatibû ber çavên wî. Dema li derî qûn datanîn ser berfê û xwe bi

jêrê ve dişemitandin, wekî perdeyeye sînemê di ber çavên wî re derbas bibû. Bi bihîstina ferqiya wê rojê û vê rojê, dilê wî hatibû qurmiçandin. Hişê xwe ji xeyalan anî cihê ku lê ye.

Laşê wî tev qerimîbû. Zor da lingê xwe ku rabe ser xwe û cî biguhere. Lê lingê wî bi ya wî nekir û êşeke wekî xencerekê, li ser kezeba wî da. Dilê wî xav bû û dinya li derdora wî zîvirî, her der bêtir reş û tarî bû.

Her du destê xwe avêtin lingê xwe yê birîndarbûyî. Lingê xwe bi hêdî ji erdê rakir û ber bi lingê rastê ve kişand. Dîsa bi her du destan ji tehta li ber xwe hêz girt û rabû ser lingê xwe yê saxlem. Li pişt tehtê nêrî. Di navbera beran de çavên xwe li cihekî ku bikaribe xwe dirêj bike gerand. Kamaxa xwe danî ser tehta li pêşiya xwe. Rahişt lingê xwe yê şikestî, li dora tehtê laşê xwe zîvirand û lingê xwe yê saxlem kişand milê din ê tehtê. Lingê xwe yê birîndar bi hêdî berda erdê. Pişt re qeweta xwe da ser lingê saxlem û kamaxa xwe gihand ser berê li jêrê. Dîsa rahîşt lingê xwe yê birîndar û xwe zîvirand milê din ê berê li ser rûniştibû.

Li wê derê di navbera keviya berfê û tehtan de valatiyek ku bikaribe xwe dirêj bike hebû. Lingê xwe yê birîndar danî ser berekî pehn û yê saxlem di ber re dirêj kir. Kefiya xwe û cawbaranka xwe ji ser lingê xwe vekir. Kefî avêt ser lingên xwe, cawbarank girt ser laşê xwe û xwe li ser piştê dirêj kir.

Qasî firehiya serek erd, parçeyek ji ezman û çend stêrkên perpitî li ber çavên wî daliqandî man. Dixwest ku hişê xwe komî serê xwe bike û bifikire. Lê ewqasî westiyabû û ewqasî xwîna ji laşê wî çûye ew bê hal kiribû ku mijankên çavên wî wekî evîndarên bi salan xerîbiya hev dikişînin û bi hesreta gihiştina hev dişewitin, dest dan hev û laşê wî ji cîhana janê birin cîhana xewn û xeyalên şêrîn û xweş.

Ne şer, ne birîndarî nehat xewna wî. Xume xuma kaniyekê dihat ber guhê wî. Pêlên ava berfînî li bin guhê hev diketin û peşkên qerisî diavêtin nava çav û guhên wî. Tezînok bi laşê wî ve hildikişîyan. Xwe bi dev ve diavêt erdê, dirêj fikir ku çengeke av vexwe. Lê destê wî dema fikir ku bigihêje avê, wekî bikeve nava pêta agir dişewitî û bi lez paş de vedikişîya. Robar geh dibû lehiya agir, geh dibû kaniya avsar. Dawî laşê wî bê hal diket û li kêleka gelî xwe dirêj fikir, ji ser hişê xwe diçû. Dema dihat ser hişê xwe dîsa şerê wî û avê didomiya heta ku careke din ji bê halî bê hiş diket. Êdî destê wî yê diket nava agir û vedikişîya wiha lê hatibû ku bê ruh mabû û tevizî bû.

\*\*\*

DU

Sibehê dema çavê xwe vekir, rojê tîrêjên xwe ji navsera çiyê dadixist berpala. Roj xuya nedikir, lê diyar bû ku ne kêrî bejneke bilind bibû.

Piştî xew kiribû, qet bi xwe nehisiyabû. Ket dilê wî ku rabe li derdora xwe temaşe bike. Tehteke bilind di ser serê wî re hebû. Dibe ku dijmin hîn li ser wê tehtê bû! Awirên xwe li bilindahiya girê pêşberî xwe gerand. Ti tevger diyar nedibû. Lê dîsa jî dilê wî ne rehet bû. Bi xwe dihisiya ku hîn dijmin li derdora wî heye. Ji berpala wî girî, ji ser wê tehtê heta nivê şevê gule barandibûn warê şer lê çêbûye. Piştî ketibû xew, êdî dengê guleyan jî qut bibû. Dizanîbû ku dijmin bi şev cihê xwe bernade û naçe. Wekî din jî divîbû dakevin warê şer û lê bigerin ku encama şer bizanibin. Lê ev bêdengî qet ne baş bû. Cerdewanan piç û piç ev Gelî nas dikirin, niha dûrbîn li ber çavên wana, ber bi ber li livandinekê, tevgerekê, biriqînekê digeriyan. Gelo cihê wî ji ti deveran ve diyar fikir? A baş heta dijmin xwe heşkere neke, bê livandin di cihê xwe de mayîn bû.

Wiha di dilê xwe de bi xwe re diaxift; pirs ji xwe dipirsîn û bi xwe bersiv dida. Awirên wî li tehta lingê xwe yê birîndar danîbû ser ket. Teht ji xwîna jê çûye, sor bibû û diterisî. Gelo ev tehta sor wê bal ji dûr ve bikişandiba? Ya ku hinek gelî gelî hatibana? An hinekan bigotana; “Ka em kêleka kevandeya berfê jî saxtî bikin?”

Xwe bi xwe bi gotin û xeyalên xwe kenîya. Wekî din jî qederekê ji warê şer dûr ketibû. Diyar e, gihiştibû dawîya çeperê. Ger sed gavên din şemitîba wê çeper bi tevahî derbas kiriba. Ji xwe re got:

- “Ez bawer nakim li vê derê xwe berdî jêrê. Wê ber bi jor ve biçin; li nuqtê bigerin û lêgerîna xwe bi dawî bikin. “

Dilê wî çû cixareyekê. Kîsikê tûtina xwe ji bêrîka xwe derxist. Destê xwe li binê kîsik gerand, kêmeke kamaş hat nava tiliyên wî. Di nava her du tiliyên xwe yên destpêkê de hinek tûtin derxist û li ser kaxezê bi cih kir. Bi hostêyî pêça û bir nava lêvên xwe. Çeqmaqê xwe derxist ku pêbixe lê wekî yek wî bihejîne û jêre bêje, “Kuro tu çi dikî?” hişê wî hat serê wî. Hindik mabû bi dûmana cixarê cihê xwe heşkere kiriba. Piştî ewqas ked, ewqas hewildan, bi dûmana cixareyekê wê her tişt li ber ba ketiba û biçûya! Ma hindik caran wiha bibû? Ji dîroka şer dizanîbû û gelek mînak dihatin bîra wî.

Nefsa xwe temirand û cixare ji nava lêvên xwe derxist, ew û çeqmaq danîn kêleka xwe, ser berekî. Cawbarank kişand ser serê xwe û li hêviya dengderxistina dijmin ma.

Roj qedereke din bilind bû û ronahiya xwe da ser rêka di beralê re berwarkî xêz dibû. Rêk, cih bi cih diyar dibû û dîsa winda dibû. Hat bîra wî ku şevê din di wê rêkê re hatibûn. Bi awirên xwe rêk şopand. Gelo ew zinar bû? Belê heta zinarekî wekî wî zinarê diyar dibe hatibûn û li wir bêhnek vedabûn. Çi bibû, di wê bêhnvedanê de bibû. Cîgirê fermanarê yekîtiya gerîla, du hevalên xwe rêkiribûn

ser depoyekê ku hebe, hinek qût bînîn. Ev çend roj bûn bê qût mabûn. Bêtir bi giya xwe xwedî dikirin. Lê êvara bi rê ketin, rûnê wan jî qediyabû. Cerdewan ev du roj bûn li ser girekî pêşberî wan bi cih bibûn û tevgera wan dişopandin. Roja dawî cerdewan ferq kiribûn û têgihîştibûn ku wê operasyonek bi ser wan de were. Nuqteya wan ji bo şer baş bû. Cihê wê bilind bû û berên ji xaniyan mezintir li derdora wan hebûn. Dikarîbûn bi rojan şer bikin lê ji destê bêqûtbûnê pêwîst bûn paş de vekîşin. Bê xwarin û vexwarin, ne çend rojan; di van rojên dirêj û germ de, çend saetan jî nikarîbûn li ber xwe bidin. Wê kabên kê bişixulîna ku biçin Kavlê Memê û dakevin? A baş cîguhertin bû. Lê ji bo vê, pêwîst bûn bi fermandarê yekîtiyê re têkiliyê deynin û xeberê bidinê, raya wî bistînin. Dawî ew jî pêk hatbibû. Dema yekîtiya gerîla pariyên giyaşê zozanan ên li ber rûn qelandî bê nan diavetin devên xwe, cîgirê fermandar li ser tehteke bilind, bi bêtêlê, bi fermandarê xwe re diaxivî. Fermandarê yekîtiyê ev du şev bûn du şervan girtibûn gel xwe û daketibû gundê cerdewanan ku bikaribe hinek qût peyde bike. Qasî cerdewanên neyar, cerdewanên dost jî hebûn û xwe li van dostan girtibûn. Xwe gihandibûn şivanan û bi rêka wan re têkilî bi cerdewanên dinasîn re danîbûn. Cerdewanan saloxa operasyonê bi kêmeke qût re gihandibûn fermandar. Wî jî bi bêtêlê ev salox ragihandibû cîgirê xwe û bi şîfreyê fermana vekîşîna ber bi Kêlbiçûkê ve dabûyê.

Li ser vê yekê, piştî xwarina êvarî, cîgirê fermandar yekîtiya xwe kom kiribû û ber bi Kêlbiçûkê ve derxistibû ser rê. Lê gelek ji gerîlan bi guhertina warê xwe ne razî bûn û bê dilê xwe gav diavêtin. Herçiqasî tevan cerdewan bi çavên xwe dîtibûn jî, digotin; “Ji xwe hatine kifşa erazyê” û nedixwestin li ser zikê birçî bi saetan bimeşin. Lê dema yekîtiyê bi rê ket û rêzan ketin pêş êdî yên bi dil jî,

yên bê dil jî pêwîstî gavavêtinê bibûn. Bes di bêhnvedanê de bédiliya heye xwe tam diyar kiribû. Gerîlayên çûbûn ser depoyê, tenekeyeke rûn û piştiyeke nîsk anîbûn. Ka bê ji kengî ve di binê depoyê de mabûn. Depo, yeke kevnare bû û vê biharê qût ne ketibû hundirê wê. Ji ber ku cîgir nû hatibû herê mê, şervanên ji kevin de herê mî dinasîn di rêbariyê de gotibûn; 'Par depoyeke me li vê jêrê hebû, ka em biçin lê binêrin, dibe ku tiştek tê de mabe'. Ji ber birçîbûna yekîtiyê, cîgirê fermanîdar nikarîbû ev daxwaz nepejîranda. Yekîtiya xwe rawestî dabû û her du şervanên kevin ber bi depoya kevin ve herikîbûn. Heta ji depoyê ve geriyabûn, hinek gerîla di xew re jî çûbûn. Ji xwe li nava gerîlan belav bibû ku du şervan çûne ser depoyê û di nava xwe de dest bi hêvî û şîroveyan kiribûn jî!

- "Xwezî tûtîninê bînin bes e, ji bêtûtîninê ezê hişê xwe bixwim."
- "Na lo, hevalên çûne ez dinasim, ne ewqasî bîreycî ne. Ger hebe wê bînin."
- "Ka bila hinek qût bînin, kabên me bişixulin wê tûtînin jî peyde bibe."
- "Qey bi te re heye, tu wiha bisteh diaxivî?"
- "Na wele nîne, lê ez dikarim îdare bikim."
- "Ê min ji xwarîninê bêtir, tûtînin zora min dibe. Bila tûtînin hebe, ez dikarim bi rojan bê xwarînin bimînim."
- "Ka belkî tûtîninê jî bînin, çay û şeker jî bînin."
- "Ez bawer nakim van tiştan bînin. Kes di depoyê de tiştên wiha giranbuha nahêle."
- "Ma ne ji payîzî ve kes nehatiye vir ku jê derxistîbin."
- "Belkî payîzî vala kirîbin. Deh yekîtî di vir re çûn û hatin."
- "Tu jî devê xwe li xêrê venakî, lazîm wê tiştek tê de mabe, qey ji binî jî vala nabe, ma bû çî?"

Piştî van sohbetên bê encam herkesî kefiya xwe kişandibû ser serê xwe, pal dabû çenteyê xwe û wekî gotina Botaniyan, “Pix kiribûn xewê.”

Cîgirê fermanदार wekî li ser agir be ne rehet bû û nerehetbûna wî di gera wî de diyar dibû. Tirsawî ew bû ku dereng bikevin û rêka li pêşiya xwe nikaribin qut bikin. Ji bo vê çawa dîtibû hevalên wî ji ser depoyê vedigerin, emir dabû ku yekîtiyê tev rakin û bikevin rêza meşê.

Lê îroj ti tişt li gorî xwesteka wî nedimeşiya. Gerîlayên çav li qût ketibûn, bêtir kabên wana sist bibûn, dilê wana ji meşê xav bibûn. Ji xwe ji mêj ve femandarekî taximê û yekî mangê xwe dabûn kêlekekê û bibû pistepista wana. Berya yekîti bi rê bikeve her du hatibûn cem cîgirê femandarê yekîtiyê û xwesteka xwe pêşniyar kiribûn. Cîgir di cih de xwesteka wan red kiribû, lê wana dubare dikirin û dengê wan çûbû çend şervanên din û ew jî li wê derê kom bibûn. Êdî rêza gerîla li bin guhê hev ketibû. Hinek gerîla bi cîgir re ketibûn guftûgo û devjengiyê, gerîlayên zêde serê xwe bi tiştên wiha re nediwestandin jî careke din qûn dabûn erdê û li hêviya encamê xilmaş bibûn. Êdî wiha lê hatibû ku femandarên yekîtiyê tev hatibûn gel hev û li ser planê meşê, nêrîna xwe diyar dikirin.

- “Hema li jêra me, deh deqîqeyan nakişîne; nuqteyeke pir xweş heye. Em biçin wê derê, xwarinekê bikelînin, bila heval têr bixwin û dîsa em dikarin bi rê kevin.”

- “Yaw ma tu dînî? Heta em biçin nuqtê, heta em qirşikan kom bikin, heta em xwarinê çêkin û heta em bixwin wê li me -ne bibe sibeh-wê bibe nîvro.”

- “Tu jî zedê abartme dikî. Hemû karê saetekê ye. Saet hîn nehê şevê ye. Heta em xwarinê çêkin û bixwin bila bibe deh, bila bibe



yazdeh. Heta ji bo xatirê te bila bibe duwazdeh. Li wir hîn ji berbangê re pênc saet dimînin. Bila çar saet bimînin. Li ser zikê têr di çar saetan de, tê ne bigihê Kêlbiçûkê, tê xwe bigihînê Kato jî:”

- “Ez nuqtê dinasim, belkî niha darê hazir jî li wir hebin. Par me gelek dar anîbûn nuqtê.”

- “Jê re dibêjin ‘Nuqta Şiyar’, nuqteyeke pir saxlem e. Zêde nehatiye bikaranîn û cihê wê jî baş e.”

- “Wele bi vî halê birçî em heta sibe êvarî jî bimeşin, em nikarin bigihên Kêlbiçûkê. Li van rûtahiyan wê li me bibe roj û dijmin me bibîne. Qewet nîne ku em biçin tepeyan jî bigrin.”

- “Yaw ma hûn fêhm nakin, wê sibe operasyon derkeve, pêwîst e em dûr bikevin.”

- “Operasyon derkeve jî wê li ser nuqteya şikêran a em jê hatin çêbibe. Bawer nakim jê û vir ve were. Heta xwe berdin nuqtê û li nava şikêran bigerin, ji xwe wê bibe êvar û pê re negihên ku ber bi vî alî ve werin. Emê jî êvareke din bi rehetî rêka xwe qut bikin û hevalan hilgirin saxlemiyê.”

- “Wele însanên dîn jî wekî we nakin. Çima em îşev nameşin xwe ji çepera operasyonê navêjin der ve, çima emê li hêviya şeveke din bimînin?”

- “Bawerke kabên min naşixulin ku ez deh gavên din bimeşim. Va ye ez li vir rûdinê û hûn dixwazin biçin, dixwazin bimînin.”

- “Heval rabin, wiha nekin, hûnê me bidin îmhakirin.”

- “Tu jî xwe zahf ditirsînê lo, em van deran piç û piç dinasin. Ku em dibêjin çi nabe, bizane ku çi nabe.”

Êdî ti rêk li pêşiya cîgirê fermanदार nemabû ku yekîneya xwe bimeşîne. Înisyatîf ketibû destê fermanदारê taximê xortan û mangeyan. Tenê ew, fermanدارa taxima jinan û du-sê şervanên bi

tecrube alîgirê domandina rêkê bûn. Çend kesên bê biryar jî hebûn. Lê pirahiya din ji mêj ve biryara xwe dabûn ku xwe bi lez bigihînin Nuqteya Şiyar û “pix bikin xewê.”

Wî bi xwe jî pişgiriya cîgirê fermandarê yêkîneyê kiribû û bi israr jê re gotibû ku mayîna li nuqteya Şiyar întîxar e. Cîgirê fermandar jî ev dizanîbû û dipejirand, lê êdî ti ji destê wî nedihat. Pêwîst mabû biryarê di aliyê pêşniyara pirahiyê de bide.

Dema ghiştibûn nuqteya Şiyar êdî xwarin jî jibîr kiribûn. Ên dighiştin ber latan, cihek rast dikirin û xwe diavêtin erdê, kefiya xwe dikişandin ser serê xwe. Çend şervanên bi rastî birçî vala vala li dar û qirşikan geriyabûn. Ji tehtan û ji berfê zêdetir tiştê tinebû û bi vana her duyan jî nîsk nedipijiya. Dawî ew jî westiyabûn û ji pêwîstî xewkirin hibijartibûn.

Ji ber ku gerîlayên xort destpêkê ghiştibûn nuqtê û xwe bi cih kiribûn, ji gerîlayên jin re aliyê din ê gelî mabû. Du dol ji jorê ve dihatin nuqtê û li binya zinarên gerîlan li binê rawestiyane dighiştin hev, dibûn geliyekî fireh û Gelî ber bi Ava Mijîn ve serjêrê dirêj dibû. Dema hatibûn nuqtê dolikek ji van her duyan derbas kiribûn, êdî gerîlayên jin jî pêwîst mabûn dolika din derbas bikin û biçin wî milê berfê. Bi vî awahî yekîtiya gerîla bibû du parçe û geliyek mişt ji berfê ketibû navbera wana. Piştî xwe dabûn lat û zinarên saxlem, lê li pêşiya wana yek ber tenê tinebû ku ji wana re bibe sîper. Lê ewqasî westiyabûn û bêhaliya birçîbûnê kabên wana sist kiribû ku kî digiha bejahiyê di cih de li erdê dirêj dibû û çavên wî diçûn ser hev.

Ew û cîgirê fermandarê yekîtiyê hîn li wî milê Gelî mabûn. Ji ber ku cîgir aciz bibû li ser tehtekê rûniştibû û yekîtiyê rêkiribû nuqtê. Kes ji şervanên wî li hêviyê nemabûn û herikîbûn nuqtê. Ew li paşya tevan hatibû û li cem cîgir rûniştîbû. Cîgir, ji binê bêrîka xwe kêmek tûtin

derxistibû û yek pey yek du cixareyên navîn jê pêçabûn; yek dabû wî û yek jî biribû nava lêvên xwe. Agirê çixarê bi dizî pêxistibûn, di kefa destê xwe de heta miza dawî dûman kişandibûn û pişt re daketibûn nuqtê. Dema hatibûn nuqtê di nava laşên li pey hev dirêjbûyî de, ji xwe re valahiyek dîtibûn û xwe avêtibûn erdê. Lê ew, wekî dizanîbû wê sibehê çî were serê wana, heta derengiya şevê xew neketibû çavên wî. Piştî xilmaşbûneke dûvdirêj ecêb dilê wî bijiyabû cixareyekê. Çend binikên çixarê ji bo bêhnên wiha avêtibû binê bêrîka yelegê xwe. Dikarîbû ji wana cixareyek çêbikra û bikişanda...

\*\*\*

SÊ

Çavê wî li cixareya wî ya bi çeqmaq re daniye ser ber ket. Rahîşt cixareyê û bir nava lêvên xwe. Kefiya xwe avêt ser serê xwe. Kêlekên kefiyê xistin bin rehnên xwe. Serê xwe baş tewand û di kefa destê xwe de çeqmaq pêxist. Dema ji çixarê dûman hat devê wî, çeqmaq vemirand û bi dilekî rehet got:

- "De çî dibe bila bibe."

Lê bi wê gotinê re wekî ku dengê wî çûbe dijmin, ji ser zinarê li pişt wî bilind dibû, baqek gule qêriya. Dûmana kişandî di qirika wî û sînga wî de ma. Çavên wî sor bûn û kuxik ket qirika wî. Serê xwe da paş û çavê xwe ber bi jor ve gerand. Di vê bêhnê de ji sê-çar çekan pêk re deste deste guleyên din qêriyan. Çavê xwe çiqasî gerand, tiştê nedît. Dengê çekan êdî yek pey yek dihat û her diçû, jê dûr dibûn, ber bi aliyê jê hatiye ve diçûn.

Ji dengê çekan têgihişt ku dijmin çeperê teng dike û xwe berdide nuqtê, warê şer lê derketiye.

Bîstikêke din gurîniya gule û rokêtan bi nuqtê ket. Ji xwe pirs kir:

- “Gelo hinek sax an birîndar li nuqtê mabûn? Guhê xwe da ser dengê çekan û têgihîşt ku tenê çekên dijmin diteqin. Hênkahî ket dilê wî. Pêk re dengê çekan qut bû.

Pite pita baskê helîkopterekê ji dûr ve hat ber guhê wî. Pite pit her ku hat, nêzîk bû. Bêhneke din di aliyê Girê Mîjîn re hat li ser girê raserî Dola Şumûniyê danî û ji ber çavan winda bû.

Dilê wî dîsa çû cixareyekê. Careke din bi serê tiliyên xwe binê bêrîka xwe vekola û nîvcixareyek jê derxist. Li ser pelê raxist. Li hev pêça û bir nava lêvên xwe. Çeqmaqê xwe pêxist lê agir neda. Parçeyek berikê dawî qasî serê derziyekê ji ber çerxa çeqmaq pengizî.

Di ber xwe de bi halê xwe keniya. Çeqmaq bir ber guhê xwe û hejand bê gaza wê heye yan nîne. Dît ku gaz heye. Ji xwe re got:

- “Ger tenê berik be, pirsgirêk nîne.”

Destê xwe dirêjî qapaxa bêrîka gumlegê xwe kir. Ji bêrîka xwe cuzdaneke biçûk derxist. Bi serê tiliya xwe hundirê wê vekola. Nasnameya ERNKê û ya ARGKê, jilêtek, pakêteke derziyên dirûnê, pîmekî saetan û parçeyek bant ku li berikan pêçaye hat ber çavê wî. Bant derxist û bir nava diranên xwe. Bi serê diranên xwe bant vekişand û berikek di devê wî de ma. Bant dîsa xist cihê wê, cuzdan xist bêrîka xwe. Qapaxa bêrîka xwe girt û berik ji devê xwe derxist, bi şalê xwe ziwa kir pişt re, malberika çeqmaq derxist û tê de bi cih kir. Malbêrik da ser cihê wê û tiliya xwe bir ser çerxê. Çerx zîvirî û agirek rengîn jê bilind bû.

Bi lêvkeniyêke serkevtî cixareya xwe pêxist, du-sê hilm kişandin û dûmana wê ber bi erdê ve pifand. Dûman li erdê ket û bi ber kevandeya berfê ve belav bû.

Helîkoptera li ser gir danîbû bi hatina pite pita baskên wê re, li jorê diyar kir. Dema berê xwe da Qlaban û zîvirî, tîrêjên tavê di şibakeyên wê re derbas bûn. Ferq kir ku li paşya şibakeyan ti reşahî nînin. Ji xwe re got:

- “Xuya ye ji wana re qût aniye. Wê çaxê dibe ku îroj neçin.”

Bi vingîniya mêşekê re veciniqî. Helîkopter jî, dijmin jî, operasyon tev jî ji hişê wî çûn û çavên wî li nava serê wî beloq vebûn. Awirên xwe dirêjî ser cihê vingînî jê tê kir. Mêşeke girsî kesk li derdora lingê wî dizîvirî û dixwest cihekî bicibîne ku xwe deyne ser!

Bi lez kefiya xwe ji ser stûyê xwe daxist, her du guhikên wê kirin yek û pê danî mêşê. Mêş pengizî û dîsa rabû. Kêmekê firiya û dîsa hat. Dîsa lê da. Serê kefiyê li jorê zîvirî û di ber mêşê re hat li nivê birîna wî ket. Hestî di goşt re rabû û janê da ser dilê wî. Bi hêrs kefi bilind kir û danî mêşa nêzîkî erdê dibe. Mêş bi erdê re kir yek. Ji kêfa kuştina mêşê re jana birîna xwe jibîr kir. Kefî girt ser birîna xwe. Di cih de cixareya wî hat bîra wî. Ji tîrsa mêşê re nizanîbû daniye ku derê. Dûman jî jê ranedibû. Li derdora xwe nêrî. Li ser berê li kêleka wî xweliyeke spî, dirêj dibû. Cixare xwe bi xwe hatibû dawî. Mêşa xwînswar nehiştibû ku hilmekê jê bikişîne. Dilê wî qurmiçî. Awirên wî li ser xweliyê daleqandî man.

Tavê da tevahiya bejna wî. Li saeta xwe nêrî. Dem derdora nivro bû. Gelo planê dijmin çi bû? Gelo lêgerîna nuqtê qedandibûn? Gelo wê li derdora nuqtê bigeriyana? Ya ku li ser berfê şop dîtîbin? Ya ku cerdewanek bêje; “Ka em serjêreyê berfê biçin.”?

Gelo dikarîbû hinekî din xwe bi jêrê de bişemitanda? Gelo berf heta Geliyê Mijîn diçû? Xwezî çûba! Ger berf heta Geliyê Mijîn çûba pir baş bû! Wê xwe avêtiba ser berfê û li ber gelî bisekîniya. Devê xwe, wê bixista Ava Mijîn û robar tev vexwariba. Wê birîna xwe pê

şuştiba û paqij kiriba. Niha li derdora avê giyayê xwarinê jî hebû. Kî dizane, belkî hinek fêkiyê ji daran ketiye jî, li ber avê bihata. Wê demê deh rojan jî bimaya, ne xema wî bû. Heta hevalên wî dihatin û ew didîtin, wê bi kêrê xwe hatiba.

Serê xwe rakir ku di ser kevandeya berfê re binêre ka berfa di Gelî de heta ku derê dirêj dibe. Rûniştî bejna wî têrê nekir ku serê wî bi ser kevandeyê bikeve. Bi her du destan ji erdê hêz girt û kamaxa xwe danî ser berê bêhna din cixare danîbû ser. Lingê wî yê birîndar hejîya. Serê hestî careke din di goşt re derbas bû û janê da ser dilê wî. Lê ji ber ku xwe ji êşê re amade kiribû, guh nedayê.

Serê xwe bilind kir û li jêra Gelî nêrî. Girê Mijîn tam li hemberî wî bû. Dijmin her sal di van deman de dihat li serê gir bi cih dibû. Îsal hîn nehatibû. Awirên xwe ji ser gir, gelî bi gelî ber bi xwe ve anî. Çi bibîne!? Devê wî ji hev vekirî ma. Gelo rast didît an xeyal bû? Laşê xwe kişand jêrê. Hinekî fikirî û ji xwe re got:

- “An bextê min pir vekirî ye, yan qedera min hîn tamam nebûye. Mirov bi zanebûn tevbigere, nikare li vê derê raweste!”

Bi rastî jî di vê birîndariya wî de qasî vîn û biryara wî ya xurt a jiyanê, bextewarî ya wî jî alîkariyeke mezin dabûyê. Ji lingê xwe birîndar bibû. Dema hîn nû parçeyên roketê li lingê wî ketibûn, du-sê qetên hestî wekî diranên di nava lêvên sore de spî bikin, serê xwe dirêjî derve kiribûn. Bi lez şûtika xwe ji piştta xwe vekiribû ku li ser birînê bipêçe. Wê demê destê xwe avêtibû van serê hestiyên û kişandibûn. Du qetên qasî tiliya qereqîçkê û qetek biçûktir jê kişandibû û avêtibû erdê. Pişt re şûtika xwe tev –ne kêmi duwazdeh metreyan bû- ji binê birînê heta kêmekî jora birînê pêçabû. Lê dîsa jî nikarîbû raba ser lingê xwe û pêlê bikraya. Dev ji pêlêkirinê berde,

her ku dihejiya serê hestiyên qet jê vebûne, di goşt re radibûn û êşeke dijwar ji ling heta kezebê dirêj dibû.

Bi wî halî, xwe bi qûnkişkê ji nuqtê û ji çepera dijmin derxistibû. Xwe li ser berfê şemitandibû û piştî demekê berfê ew avêtibû kêlekê. Niha nû didît ku berfê çawa alîkarî û qenciyeke mezin pê kiriye. Serê xwe zîvirand û li paş xwe nêrî. Çend gav li jora wî gelî dizîvirî.

Êdî niha her tişt dihat têgihiştin. Dema bi lez dişemitî, ghiştibû vê zîvironekê, ji ber ku zîvironek nedîtibû, li gorî wê berê xwe jî nezîvirandibû. Li gorî zagona fizîkê ya reva ji navendê, berfê ew avêtibû kêlekê. Eniya wî li tehtê ketibû û bê hiş ketibû valatiya navbera kevandeyê û tehtê. Bi vi awahî berfê yan jî, zagona fizîkê jiyana wî xelas kiribû. Ji ber ku piştî zîvironekê qasî sed gavên din berf di Gelî de bi dawî dibû. Ger berfê ew neavetiba kêlekê û rêka xwe domandiba piştî sed gavên din wê li ser reşahiyê biketa û di gelî de berek tenê ku xwe li derdorê veşêre jî diyar nedikir. Ger xwe daba kêlekekê jî gumana dîtina wî, ji ya nedîtina wî zêdetir bû. Dema hatiba dîtina jî, wê bihatana ser ruhê wî û hîn ji dûr ve bi gule û roketan ew temam bikrana. Di nivê rûtahiya Gelî de, qet derfeta şer û berxwedanê jî nedidanê. Ji ber wê pir bextewar bû ku berfê ew avêtibû der ve.

Dema ev fikar tev dikirin, bêdengiyê mezin li derdorê serdest bibû. Ev demek e, roj li ser serê wî daleqandî mabû û tîrêjên xwe dida nivê eniya wî. Laşê wî baş germ bibû û xwêhdan bi sînga wî ketibû. Nû pê hisiya ku lêvên wî ziwa bûne û birçî ye.

Her çawa be, dema çentê xwe dabû hevalên xwe, kevçiyê tê de, bi radyo û cawbaranka xwe re girtibû cem xwe. Ji bo çî kevçî girtibû cem xwe nedihat bîra wî. Dizanîbû ku xwarin bi dest nakeve, lê wekî

yek di dilê wî de biaxive, wiha ketibû dilê wî û kevçî berdabû bêrîka yelegê xwe.

Niha tedigihişt ku ji ber çî anîna kevçî ketiye dile wî. Kevçî ji bêrîka xwe derxist û destê xwe dirêjî keviya berfê kir. Berf ewqasî req bibû ku xirte xirt pê ket. Bi serê kevçî berfa serî ya hinekî reşbûyî kola. Dema berfa spî derket kevçiyê xwe tije kir û anî ber devê xwe. Berf êdî him xwarina wî bû, him jî vexwarina wî.

Baş e, lê heta kengî?

Li derdorê qet tayeke giya jî tinebû. Cihê lê bû, berfê xwe nû ji tehtë dûr xistibû û tev lat û teht bûn. Cihê ax lê hebe, tinebû. Ji bo wê pêwîst bû fêrî xwarin û vexwarina berfê bibaya. Ji xwe re got:

- “Çawa be ji berfa piştî Kongrê paqijtir e.”

Dema kevçî bi kevçî berf dibir devê xwe, dimijt û dixwar salên notî hatin bîra wî. Ji bo Kongre ya Çaremîn li Heftanînê bi cih bibûn. Wê demê jî qûtê wana tinebû. Tenê ji bo bikaribin Kongrê rêve bibin kêmek qût peyde kiribûn; ew jî hîn Kongre bi dawî nebibû xelas bibû. Ji xwe piştî kongrê şerê Kendavê destpê kiribû. Firokeyên Amerîkî yên ji Tirkiyê radibûn, di ser xaka Heftanînê re diçûn li Îraqê didan. Ji bo wê hêza Kongrê bi fermana rêvebir çûbû zozanên Heftanînê. Li navsera girekî bilind bi cih bibûn. Zêdeyî bejneke berf li erdê bû û hîn jî dibariya. Him jî reş dibariya. Her ku çalên petrolê dihatin bombekirin û dişewitîn, dûmana wana tev li ewran dibû û berfa reş dadiket erdê. Ev berf kom dikirin, di teneke û çaydanan de dikirin av; lê çî av! Nêvî zêdetir petrol bû û dema vedixwarin şûn re agir bi hinava wan diket. Lê ji bo parastina hêzê, rêvebir nedihîşt ku yek gerîla dakeve gelî û wiha mehekê zêdetir ew berfa bi petrol xwaribûn û vexwaribûn. Ji xwe re got:

- “Baş e ew rojên hanê niha dibin tecrube” û di ber xwe de keniya.



Roj êdî ber bi esir ve diqulipî, siya wî êdî ji milê wî yê rastê, ber bi milê çepê ve dirêj dibû. Ji nêzikê nuqta şer lê derketibû dengê kit û mitên gulebarandinan dem bi dem dihat. Di dilê xwe de bi xwe dihisiya ku hîn dijmin li derdorê ye, li nuqtê ye, li serê gir û navserê ye. Dilê wî jê re digot; 'Nelive, te evqas borandiye, kêmeke din bisebire, tê biserkevî'.

Lê ji germahiya rojê ye, yan ji têrxwarinê ye, hêdî bi hêdî xeweke bêeman dida ser çavên wî û mijankên wî bi hesreteke wekî ya evîndaran ber bi hev ve dikişandin. Berxwedana wî li hemberî vê hesretê bêçare ma û ji ser hişê xwe çû.

\*\*\*

## ÇAR

Bi pite pita baskê helîkopterê û qurme qurma rokêtan hat ser hişê xwe û çavên xwe ji hev vekirin. Çawa hatibû xafilîyê û xew kiribû? Xewê çawa ew têk biribû? Ma niha dema xewê bû? Êdî nizanîbû dijmin li ku derê ye û di çi tevgerê de ye! Ewqasî ji sibehê ve tevgera dijmin şopandibû, tev vala çûbû. Ger xew nekiriba, wê behtir wate bidaya dengê dijmin derdixe.

Serê xwe bilind kir û li bilindahiyên derdora xwe nêrî. Tiştêk diyar nedikir. Xwezî niha dûrbînek li cem hebaya!

Pite pita helikopterê nêzîk bû; hat Gelî borand û dîsa li ser girê raserî Dola Şumûniyê rawestiya. Çend baq gule pêk re li nuqtê hatin reşandin û pişt re bêdengî ket derdorê.

Qasî vexwarina nîvcixareyekê şûn re helikoptera li ser gir, bi pite pit diyar bû. Serê xwe bilind kir û bi awirên xwe helîkopter şopand. Dema di ber tîrejên rojê re derbas bû dît ku pişt şibakeyên wê tarî ye. Di wê bêhnê re helîkoptereke din diyar bû û ew jî hat li serê gir

danî. Êdî şik û gumana wî nemabû ku dijmin operasyon diqedand û hêza xwe paş de vedikişand.

Ber êvarî hîn reş neketiye erdê, gire gireke xerîb ket ser Gelî. Bi paşdeçûna dijmin kêfa wî hatibû û rehet tevdigeriya. Heta carekê qasî sê gavan paş de çûbû destav kiribû û dîsa hatibû cihê xwe. Carekê jî heta nivê bejna xwe rabibû ser kêleka kevandê û têr li derdorê temaşe kiribû. Ji xwe re digot:

- “Sedî sed dijmin vekîşiyaye.”

Baş e lê ev gire gira xerîb çi bû? Xwe nezîkî kevandeyê kir. Lingê xwe yê saxlem kişand ber xwe, hêz jê girt û rabû ser. Bejna wî bi ser kevandeyê ket. Êdî dizanîbû ku siyeke tarî ketiye ser Gelî û ji dûr ve nayê xuyakirin.

Devê wî carekê din ji hev vekîrî ma. Di cih de qûn berda erdê û pal da ser tehtê. Ji xwe re got:

- “Êdî ev ji me kêmbû!”

Hêza dijmin li ser Girê Mijîn bi cih bibû û elektrîkên xwe jî pexistibûn. Ev dengê xerîb jî dengê jeneratora wan bû. Cerdewan û leşker li derdora kozikan diçûn û dihatin. Xuya ye dîwarên hilweşiyayî saxlem dikirin.

Di ber xwe de ponijî û got:

- “Êdî bi roj nikarim bilivim, bi şev jî nikarim bisteh çixarê vexwim. Xweş, tûtin jî diqede, lê dîsa jî ne xweş e.”

Pişt re hat bîra wî ku hevalên wî yên bi vi alî ve werin, hîn li serê Dola Şumûniyê wê li ser Girê Mijîn dijmin bibînin û rêka xwe biguherînin. Ji xwe êdî bi roj nikarin werin. Qet nebe, kêmek derman hebaya ku lingê wî lareş negirta. Ji niha ve nê (nê/elem)ê tê re avêtibû û bêhna genî, wekî ya pişt hêstira çerm ji ser çûye, pê ketibû. Ji xwe ku wê mêşika kesk li ser danîba û hêkên

xwe berdabayê, we kurm biketana birînê û êdî lingê wî ji dest biçûya. Êdî ku bigihişt textor jî, ji qutkirinê xelas nedibû. Dema lingê qutkirî yê hevalemî xwe dîtibû, hat ber çavên wî, dilê xwe bi xwe şewitand û got:

- “Ezê wan rojan nebînim. Dema bizanibim wê lingê min were jêkirin, ezê jiyana xwe bi dawî bînim, baştir e.”

Di wê bêhnê re, keviya berfê li ber çavê wî ket û hat bîra wî ku birîn cemidî be zû bi zû xera nabe. Lê bi vê ramanê re ramanekê din hat bîra wî û li ser vê ramanê tevahiya mejiyê xwe rawestand ku çareyekê bibîne. Lê çiqasî hizirî ti çareya wê nedît. Mejiyê wî bi vê ramana neçar ewqasî westiya ku di xew re çû.

Di xewna xwe de didît ku ewr li ezmanan kom dibûn û baranekê xurt dadiket xwarê. Berf parçe parçe dihiliya. Pişt re taveke dijwar derdiket û berfa maye tev dikir lehî û sîper li ber wî nedihîşt. Êdî li cihê xwe rûniştî leşker û cerdewanên di kozikan de dijmartin. Cerdewanekî bi dûrbîna xwe temaşeyê Gelî dikir. Pişt re ew û leşker pêk re temaşeyê Gelî dikirin. Qîrek ji gir bilind dibû û dijminê li ser gir tev radihiştin çekên xwe, berê wana didan Gelî û çek diteqandin. Wekî vingîniya mêş û mozqirkan gule û roket di derdora wî re diçûn, lê hîn li erdê neketine winda dibûn.

Wî jî radihişt çeka xwe, berê wê dida tepe û pêlî lingê wê dikir. Gule yek pey yek ji devê klêşa wî derdiketin û wekî bi devê tifingê ve hatibin girêdan, hîn gavekê neçûne, digindirîn erdê. Dijminan destê xwe ber bi guleyên wî vedikirin û pê dikenyan. Wê demê behtir pêlî lingê klêşa xwe dikir, lê guleyên wî qet ji gavekê pêşdetir nedichûn û guleyên dijmin êdî dihatin li laşê wî diketin. Lê qet bi êşê ne dihisiya. Yek dilop xwîn jî jê nedihat. Wekî bi mûçingê mûyan bikişîne, yek bi yek gule ji ser laşê xwe dikişandin û diavêtin erdê.

Dawî dijmin dît ku agirberdana ji dûr ve bê fêde ye. Xwe kom kirin, bûn rêz û xwe berdan Gelî, ber bi jor ve meşyan. Êdî şer wê sîngesîng çêbibaya. Wî jî da xwe ku rabe ser xwe û bi ser dijmin de bimeşe...

Bi êşeke dijwar ji xew veciniqî. Di xew de laşê xwe qulipandibû û lingê wî yê birîndar jî ji cih rabibû. Hemû seriyê hestiyên şikestî pêk re di goştê laşê wî re rabibûn û wekî xenceran gihiştibûn kezeba dilê wî.

Ji xwe re got:

- “Çi janeke dijwar e ya reb!”

Ger bizanîba piştî wê bi çend salên din wê janên ji wê sed qat diwartir bikişîne, ma ti caran wiha digot?

Ger bizanîba wê jiyana wî êdî bi tevahî bibe jankişandin, gelo wê ewqasî berxwedana jînbûnê bidaya?

Ger bizanîba gelek janên bêderman li pêşiya wî ne, wê çi bikraya?

Wî ev tev nizanîbûn û ji ber vê careke din çavê xwe li xewê girt û çû cîhana xewn û xeyalan...

Derengiya şevê, dema çavê xwe ji xewê vekir, laşê wî ji sermayê qerisîbû. Ezman bi her cûreyê stêrkan hatibû xemilandin. Stêrkên biçûk, stêrkên girs, stêrkên biriqandî, stêrkên kêmbiriqandî... Heyv hîn diyar nedikir. Nizanîbû wê kengî derkeve jî. Kefî û cawbaranka wî ji ser laşê wî herikîbûn. Destpêkê kefi, pişt re cawbarank avêt ser laşê xwe. Çavê xwe li xewê girt. Bêhnekê ma, lê çavên wî nediçûn ser hev. Kurmek hat û ket nava dilê wî, di dilê wî de dest bi axavtinê kir:

- “Tu çawa xew dikî? Ma hevalên te ji ku dizanin ku tu li vê derêyî? Ew niha wer dizanin ku tu şehîd bûyî. Qet li te nagerin û bang li te jî nakin. Pir pir biçin nuqtê û li cenazeyê te bigerin. Dema nebînin jî

we bêjin; ‘Dijmin avetiye cihekî xewle’ û biçin. Tê jî li vê derê wiha birçî û bê derman bimînî. Wê kurm bikevin laşê te. Wê sipî reşîka çavên te bixwin. Wê berfa li pêşya te bihile û dijmin were ser laşê te. Ewqas ked û hewildana te jî, wê bi ber avê de biçe. Ger hişê te hebe, tu xew nakî. Divê hîn heval neçûne nuqtê tu pêjna wan bibihîsî û dengê xwe bibî wana, cihê xwe ji wana re diyar bikî. Ger tu ne hişyar bî, ew ji ku dizanin ku tu xelas bûyî û li vî cihiyî? Ne sêhirbaz in ku ji tiliya xwe bêhn bikin û bizanibin. Ehmeqiyê neke, rabe ser xwe û hişyar bimîne!”

Cawbarank ji ser serê xwe daxist, li derdora qirika xwe gihand hev ku hewa cemidî di ber re derbasî laşê wî nebe. Lê dîsa jî laşê wî bi sermayê hisiya. Li saeta xwe nêrî. 22 û 20. Ji xwe re got:

- “Hîn zû ye, ger hatina hevalan çêbibe, heta saet 12an jî dikarin werin. Gelo wê di kîjan rêkê re werin.?”

Berê xwe da çiyê û di nava reşahiyê de awirên xwe dirêj kirin. Reşahî her ku diçû reştir û tarîtir dibû. Dîmena çiyê anî ber çavên xwe û pirsar xwe bi xwe bersivand:

- “Ma çend rêk hene? Her û wer tenê rêka em tê re hatine heye. Ger hatineke wana hebe; wê di wir re werin. Ger ez hişyar bim, ezê pê bihisim. Ne bi derfet e ku bêyî gêrkirina keviran bikaribin dakevin.”

Kurmê dilê wî ket tevgerê û axaftina wî birî, şik û guman berda nava wî û got:

- “Tu çawa bawer dikî ku îşev bi te ve werin. Hîn ew nizanin operasyon zîviriye yan na. Dibe ku hîn xwe hilnegirtibin saxlemiyê jî. Tu çima xwe dixapînî? Ger tu bê xew bimînî, tê zû ji hal bikevî û ev jî wê xerabiyê bi birîna te bike. Divê tu zêde zêde xew bikî ku laşê te zû ji qewetê nekeve. Ger heval bèn jî çû du-se rojên din werin.

Heta bi çûna operasyonê dihisin, heta ji xwe re qût dibînin, heta planê xwe datînin ku bi vir ve werin, belkî hefteyek jî derbas bibe. Ya baş, tu binive!”

Bi hêrs cawbarank kişand ser serê xwe û çavên xwe girtin. Di cih de serma ji laşê wî qut bû û hêdî bi hêdî bi germahiyeke zirav hisiya. Çavên wî hinekî sist bûn, lê hiş û ramana wî rê nedan ku ji ser xwe biçe.

- “Temam bila cawbarank li ser serê te be, bila çavên te jî girtîbin, lê qet nebe, bila guhên te vekirîbin. Çi dibe, çi nabe!? Şev, reş û tarî ye; heval neyên jî, dibe ku heywanek were, dijminek were. Ma bila te bi dest bigrin? Ma ne şerm e ku tu di xewê de werî girtin? Hişyar bimîne; qey dinya xera nabe.”

Li rasta serê wî kefî ji binê cawbarankê herikîbû jêrê û hilma ji devê wî derdiket ew qismê cawbarankê şil kiribû. Şilahî diket ser rûyê wî û ew aciz dikir. Ji bo ziwa bibe, cawbarank careke din ji ser xwe avêt û bi acizbûn got:

- “Xuya ye îşev xew ji van çavan re nîne.”

Destê xwe dirêj kir û bi serê tiliyên xwe binê bêrîka xwe vekola. Kêmek tûtin hat ber tiliya wî. Destê xwe vekişand. Ji erdê hêz girt û laşê xwe bi jor ve bilind kir, heta ku piştê wî bigihê tehta serê xwe daniye ser. Piştê xwe da tehtê û lingê xwe yê kêmekî êşiyayî bi cih kir. Kefî û cawbaranka herikîn, dîsa kişandin ser laşê xwe. Destê xwe careke din dirêjî bêrîka xwe kir. Kêmek tûtina maye bi vekolîna sê-çar caran derxist. Li ser pelê bi cih kir û pêça. Ji ber ku çavgirtî jî dizanîbû cixare bipêça, zahmetî nekişand. Serê xwe bi tevahî xist bin kefî û cawbarankê. Bi lez çixara xwe pêxist û girt kefa destê xwe. Serê xwe kişand der ve û di kefa destê xwe de, sê-çar hilmên tije li ser hev kişandin. Kom bi kom dûman daket ser dilê wî. Dilê wî hat

givaştin. Têgihîşt ku birçî ye. Lê newêrîbû vê nivê şevê berfê bixwe. Pêwîst bû heta derketina tavê bi çila xwe bikarîbaya û xwe bê av û bê xwarin bihişt!

Xurmîniyek ji deverekê bilind bû. Çend ber gêr bûn û dengê bilind derxistin. Gelo hinek dihatin?

Çavên xwe bel vekirin. Guhên xwe rep kirin. Êdî wiha hişyar bû ku mêşek firiya wê deng hatibayê. Lê ne mêş firiya, ne jî careke din ber gêr bûn. Ji xwe re got:

- "Herhal roviyek bû, yan jî hirçek. Ka xwedê dizane li ku derê çerixîne û ber ji ber lingên wana pengizîne. Piştî vê saetê, êdî bawer nakim heval bên, ji ber ku dem namîne vegezin."

Dîsa ti tam ji cixareya xwe nekiribû. Hindik mabû ku tiliya wî bişewitiya. Bi serê nenûkên xwe bi binkê çixarê girt û heta ku agir gihîşt lêvên wî dûman kişand. Dema germahiyê zor da ser lêvên wî jî, wekî mêşekê biqewitîne, destê xwe bi lez vekişand û pêk re binik avêt binê kevandeya berfê. Dilê wî bi cixareya wî ve mabû, lê êdî tiştê ji destê wî nedihat. Êdî di binê bêrîka wî de tûtina vekole jî nemabû. Her tişt li aliyekî, bêtûtînî li aliyekî. Di vê birîndarî û tinebûnê de, qet nebe bila qutiyeke tûtin hebaya ku alîkarî bida berxwedana wî.

Wekî tiştêkî xwe yê pir nêzîkî xwe winda kiribe, li ber ket. Dilê wî bêtir xav bû. Ger şerm nekiriba dikarîbû bigiriya. Pişt re hat bîra wî ku ev der ne cihê şermê bû. Gelo wê ji kê şerm kiribaya? Ji Xwedê, yan ji xwe!? Ramana Xweda ket serê wî. Hişê wî çû cîhana xeyalan. Berê jî pir caran li ser Xweda hizirîbû û xwestibû binase. Herdem şikl û şemalek jê re çêdikir û dianî ber çavên xwe. Lê nizanîbû ji ber çî ye ku ti caran Xweda wekî yekî tenê ne dihizirî. Ger dinya ji aliyê xwedayekî ve dihat rêvebirin jî, ew yek jî ji cihekî din, ji cem

xwedayên din hatibû. Li gorî wî heyetek an komeke xwedayan hebû. Wana ji nava xwe yek erkdar kiribûn ku dinyê rêve bibe. Carcaran bi xwe jî dihatin û li halê dinyê temaşe dikirin. Dema dinya hatibû avakirin jî, her yekî jêhatiniya xwe tev li avakirinê kiribûn. Lê li gorî wî ne dinya tenê ji aliye vê heyetê ve hatibû avakirin. Ji xwe ev heyet ne tenê rêvebirê dinyê jî bû. Ev xweza, ev gerdûn tev ên wana bûn? Gelo di ser wan re heyeteke din hebû? Di vî alî de nikarîbû tiştekî bêje. Lê ku hebe jî zedê tiştek ferq nedikir. Ji xwe zêde karê vê heyetê tinebû. Salê yek rêdikirin jêrê ku dinyê rêve bibe û ew jî dirûniştin, dixwarin, vedixwarin û li kêfa xwe dinêrîn. Çawa be li ti dinyayên din heyînên zindî tinebûn û ji bo vê serê xwe bi tiştekî ve nedieşandin. Di van salên dawî de guftûgo kiribûn ku dinyayeke nû ava bikin. Erkdarê li ser dinyê ev pêşniyar kiribû û gotibû; 'Mirov êdî diçin ser heyvê, cîhana wan li wana teng tê. Êdî ez ji wana ditirsim. Pirr xerab jî bûne. Ger rojekê li firokeyên wekî tîrêjê bi lez siwar bibin û li vir peya bibin, şaş nemînin. Wê demê wê dest û lingên me girêdin û daxînin xwarê'.

Li ser vê ramanê bi rojan gengeşî kiribûn. Ji heyeta xwedayan hinekan digotin: 'Em cîhanê ser û bin bikin, bila yek zindî nemîne û serê me jî rehet bibe'. Hinekan digotin: 'Em alîkariyê bidin hev, cîhaneke din ava bikin ku biçin wir, bi ser me ve neyên'. Hinekan jî digotin: 'Dev jê berdin, ji bavê wan zêde ye ku bikaribin werin vir û li hemberî me rabin. Ew baş dizanin ku bêyî me nikarin bijîn!'

Ev raman tev di serê wî de bûn û dema wiha bi tena xwe dima, diket nava lêgerîn û lêpîrsînan. Car caran cihê xwe di heyeta xwedayan de digirt û cîhan tev rêve dibir. Carcaran li ber lingê xwedayan qasî moriyekê biçûk dima û li ber bayê wana berbayê cîhanê dibû, li erdê diket, dipengizî û diêşiya. Carcaran jî bi ked û xebata xwe, gav bi gav



ber bi rojê ve dimeşiya. Serkêşiya artêşê dikir. Şoreş pêk dianî. Bang li Serok dikir, welat dida destê wî û ber bi şoreşeke nû ve dimeşiya! Xeyalên wî ewqasî fireh bûn ku carcaran ew jî ji navê dernediket û diqulipîn xewnan. Xeyal û xewn dibûn yek.

Dîsa bê hemdê xwe di xew re çûbû. Xewê ew ji cîhana rastiyan dibir û hişê wî, giyana wî, bedena wî tev rehet dikir. Di cîhana rastiyan de êş hebû, jan hebû, mirin û kuştin hebû. Lê ya tewrî dijwar ew bû ku cîhana rastiyan ew li cîhana xewn û xeyalan jî vala bernedida. Êdî êş û jan bibûn parçeyek ji xewn û xeyalên wî. Çi bi serê wî hatibû û wê hîn çi bi serê wî hatiba?!

Di xewna xwe de li ser Kanîsêvkê bû. Li navbera daran, li şivikên dara Marsîz digeriya. Dawî şivikek li gorî dilê xwe dît. Zêde ne dirêj bû, lê têra wî hebû. Hingî her hevalê di vir re derbas bibû şivikek dudu jêkiribû, tişteke pê ve nemabû. Ev şivik jî ji bo binê wê xwar bû, ji ber destê wana filitîbû. Şivikên din jî tev ên salê bûn û şivikên salê jî bi kêrî kirina darcixareyê nedihatîn.

Kêra xwe derxist û şivik ji darê jêkir, xist bêrîka hundir a yelegê xwe. Rabû ser xwe û xwe berda ser kaniyê. Dema çav li ava spî û hênîk ket, westandin û tîbûna xwe jibîr kir. Lê bi rastî dema di şikeftê de digeriya dikir ku ji têhniyê bifetise. Tevî dizanîbû ne baş e û bi kils e, dîsa jî çengek ji ava di şikeftê de dilop bi dilop dihat û dibû gol, vexwaribû. Lê têhnîbûna wî neşikestîbû. Heta ji bêhna kilsê bêtir têhnî bibû. Di hundirê şikeftê de carcaran pêwîst bû bi zikişkê, carcaran bi qûnkişkê biçê. Ji xwe bi qeydikên ji dar û werîs çêkirî daketibûnê û wiha derketibûn. Lê bi rastî ne poşman bû ku daketibû hundirê şikeftê. Yanê hêja bû zahmetiya xwe. Ava dilop bi dilop dihat, kilsa bi xwe re dianî piç û piç li ser hev kom dikir û li hinek cihan wekî mirov gilokên pembo bide ser hev, li hinek cihan wekî

tîrejên rojê ji erdê bilind bibin, li hinek cihan wekî qeşaya ji tehtan xwe dirêjî erdê bike, cûrbecûr û rengû reng dîmenên balkêş derketibûn holê. Di hin cihan de ji ber ku rê nedabû, kesên berya wî hatibûn serdanê, ew kevir şikandibûn û wiha derbas bibûn. Pir dilê wî pê êşiyabû û ji hevalê pê re gotibû:

- “Textor tu vê hovîtiyê dibînî? Bi hezaran tûrîst dil diavêjin ku cihekî wiha bibînin. Lê yên me bi pehînan pêketine û şikandine. Zahmet e ku em bi vî aqilî şoreşê çêbikin. Ger em çêbikin jî, zahmet e bikaribin rêve bibin. Heta halê me ev hal be, karê me zor e. Divê mejiyê me ji binî ve were guhertin, yan na bi rastî karê me zahmet e.”

Dest û ruyê xwe li ser kaniyê şuşt, du-sê çeng av vexwar. Av ewqasî şêrîn bû ku destê wî jê nebû. Devê xwe xistiyê û heta ku ji cemada wê janê da ser diranên wî vexwar. Dema devê xwe ji avê vekişand, bêhnçikayî bibû. Meşiya bejahiya kêleka ser kaniyê. Çeka xwe ji milê xwe danî û sipart qurmê dara gozê. Çentê xwe danî kêleka çeka xwe. Rextê xwe û şûtika xwe vekir. Gumlegê xwe ji binê şal kişand û berda ser şal ku şilbûna ji xwêhdanê li ber ba ziwa bibe. Ber bi dara sêvê ve meşiya. Tevî hîn ne sitewiyayî bûn jî maşeleh hevalan tiştêk tê de nehiştibûn. Her yekî/a derbas bibû qeflek jêkiribû. Gez li du-sêkan dabûn û yên din avêtibûn wê erdê. Beraz jî hatibûn, jê têr xwaribûn û li ser ên mane jî pîkol kiribûn. Baş bû ku hîn di darê de gelek hebûn. Destê xwe avêt katê darê û hejand. Bû pite pita sêvan; ketin erdê. Yek bi yek qasî deh-diwarzdeh sêvan ji erdê kom kirin. Ji xwe her yek ji wan, tenê gepek hebû. Sêv di coka li ber kaniyê de şuştin. Çû, piştî xwe da dara gozê û rûnişt. Sêv tal bûn, lê dîsa jî ji bo temirandina birçîbûna wî, wekî derman lê hatin. Sêva dawî bi kotekî xwar. Bi xwe dihisiya ku laşê wî giran dibû û xewê diavêt ser çavên wî. Ji xwe germahiya bin siya darê bi tena xwe terê

dikir ku wî di xew re bibe. Hevalê wî yê textor jî çûbû ser depoyê û hîn venegeriyabû. Heta ew bihata dikarîbû hinekî çavên xwe nerm bikrana. Hîn di vê fikrê de, ji ser xwe çûbû jî, dema çavên xwe vekirin, tîrêja tavê dabû nîvê çavê wî û laşê wî tev di nava xwêhdanê de hiştibû...

Derengiya sibehê bi veciqînekê ji xewê rabû. Hilma devê wî cawbarank tev şil kiribû û şilahî derbasî kefiyê jî bibû. Devê wî ji têhniyê ziwa bibû û qure qura zikê wî bû. Xwe hîn li ser Kanisêvkê dihesiband ku di dil xwe de wê avê vexwe û sêvan bixwe. Lê dema cawbarank ji ser serê xwe avêt dît ku li ber keviya berfê ye, dîsa bi rastiya xwe re rû bi rû ma. Ji bin tehta li kêleka xwe kevçiyê xwe derxist û berf kola. Dema taştê ya xwe qedand, tav qasî bejneke ji serê girê bilind daketibû xwarê.

\*\*\*

## PÊNC

Bi vê sibehê, şevderiya wî ya duwem bi dawî dibû. Şeva din ji çepera dijmin bi xweşemitandina li ser berfê derketibû. Vê şevê jî li kêleka keviya berfê, bi xewn û xeyalan şeva xwe borandibû. Niha rojeke dirêj û germ li pêşiya wî bû. Ev jî roja wî ya duwemîn bû ku bi tena xwe destpê dikir. Gelo wê ev roj çawa derbas bibaya?

Dizanîbû ku ti heval bi roj nikarîbûn bihatana cem. Ew jî ne di wê rewşê de bû ku bikaribe rabe û bi cihna ve biçe. Bi xewn û xeyalan jî dem derbas nedibû. Kurmê di dilê wî de digot:

- "Tu malê mirinêyî. Qet nebe raporeke xwe binivîse ku heval rojekê rasthatinî werin cenazeyê te bibînin, bizanibin te çawa jiyana xwe ji dest daye. Ger bikeve destê dijmin jî dîsa pelikek ji bo danasîna te ye."

Dilê wî çû cixareyekê. Destê xwe avêt binê bêrîka xwe û vepexirand. Tişteki nehat ber tiliyên wî. Kurmê çixarê zixt danê. Yelegê xwe ji ser xwe kir. Bi rêzê tevahiya bêrîkên wê di ber çav re derbas kirin. Wekî ti caran tûtîn neketibe van bêrîkan, libek tenê jî bi destê wî ve nehat. Tam hêviya xwe qut kiribû ku bêrîka gumlegê wî hat bîra wî. Demekê çend cixare pêçabûn û xistibûn bêrîka gumlegê xwe. Lazim hinek tûtîn ji wana hilweşiyabû binê bêrîkê!

Yelegê xwe danî kêleka xwe û binê bêrîka gumlekê xwe vepexirand. Kêmek toz hat ber tiliyên wî. Derxist der ve. Xuya ye ne şaş bû. Kaxezek ji bêrîka xwe derxist. Di nava tiliyên xwe de kêlekên wê bilind kirin û tûtina di nava tiliyên xwe de berda ser kaxezê. Lê tûtîn ewqasî hindik bû ku bixwesta bipêça jî nedihat lêpêçan. Dîsa binê bêrîka xwe vepexirand û hinek din toz û moza binê bêrîkê derxist. Lê tev li vê jî bêxêr bû û têra nîvcixareyekê jî nedikir.

Çavê xwe li derdora xwe gerand ku hinek binikên cixareyê bibîne û tûtina tê de maye bixe ser a xwe. Lê ti binik jî diyar nekirin. Êdî bi tevahî hêviya xwe ji tûtînê qut kir. Dilekî wi jer re got:

- “Vê piçê jî bigir û li bin guhê tehtê xîn.”

Lê kurmê tûtînê li hember rawestiya û nehişt, got:

- “Qet nebe, cara dawî du-sê mizan bikişîne.”

Dilê wî û kurmê tûtînê li hev ketin. Geh destê wî çû pelê ku tev li tûtînê li bin guhê keviya berfê bixe, geh xwest bipêçe û vexwe. Di vê dudiliyê de li ber tehta li kêleka wî, binikeke çixarê li ber çavê wî ket. Bi dîtina binik re bû daweta kurmê tûtina wî. Bi lez rahişt binik. Qasî tûtina li ser pelê tûtînê de hebû. Binik di nava tiliyên xwe de bir û anî û tûtina tê de vala kir ser tûtina din. Êdî rehet nîvcixareyek tê de hebû. Bi kêfxweşî pêça û cixareyek qasî serê teriya mişk stûr jê derket. Xist nava lêvên xwe û pêxist. Baqek dûman di qirika wî re

daket ser kezeba wî û cihê tê re çû, şewitand. Bêhn û tama kaxezê ket ser zimanê wî, lê di ber re bêhna tûtînê jî dihat û dizanîbû ku ji tinebûnê çêtire. Di dilê xwe de got:

- “Hey gidî dinya hey; dema tişt kê m bin, çiqasî bi qiymet in?!”

Dûmana ji kezeba wî vegeriya, bi serê zimanê xwe dehfand derve. Ji nava lêvên wî hilmek wekî keziyên keçan dilive, ber bi jorê ve hilkişiya. Rojên wî yê têr cixare di ber çavên wî re derbas bûn. Lê zêde guh nedayê. Dizanîbû ku hebûn û tinebûn di nava hev de ne û ji hev cuda nabin. Çawa ku goşt û hestî bêyî hev nedibûn, hebûn û tinebûn jî ji bo gerîlayekî di nava hev de bûn. Ji xwe ya ku jiyan balkêş dikir ji ev bû. Bi hebûnê rûmeta tinebûnê; bi tinebûnê jî rûmeta hebûnê dihat zanîn û mirov ji vê yekê jî dikarîbû encama keddayina xwe bidîta û berhemên hewildanên xwe bi dest bixista. Li ser zinarê di ser serê wî re bilind dibe, şerqîniya helbesta bilbilekî bilind bû û ew kişand ser rastiye. Cara yekem li dengê wiha zelal, dirêj û xilûle rast dihat. Deng ne ku derdiket wekî digindirî û dipengizî. Çawa ku sulavek ji jorê dilop bi dilop ji ser latekê xwe berde ser lateke din, ango di nava xîzan re biherike, wiha dengê li hev dizîvire û bi vê zîvirandinê geh kê m geh zêde dibe, xemgînî û kêfxweşiyê pêk re dilorîne derdiket xwezayê. Deng ewqasî balkêş bû ku germahî û reqşek berda nava dilê wî. Ger halê wî ne ev hal baya dikarîbû agirê evînê jî di dilê wî de geş bibaya. Lê bêtûşe (bêhûde) li hêviyê ma ku bilbil careke din bilorîne. Xuya ye carekê tenê loriyabû û çûbû; ji ber ku diyar ne dikir û vala vala li hêviyê mabû. Herçiqasî bilbil çûbe jî, hesreta dengê wî di dilê wî de çikiya û dilşikestî ma.

Heta tav hat ser serê wî jî, hîn hêvîdar bû ku bilbil careke din bilorîne. Lê dema bû kelkela nîvro êdî hêviya xwe şikand û hişê xwe

anî ser birîna xwe. Bi şev birîna wî pir êşiyabû û bêhneke ne xweş jî bi ser ketibû. Divîbû paqij bikraya. Lê danê sibehê ji ber sermayê dil negirtibû veke. Niha tam dema wê bû; laşê wî têra xwe germ bibû. Şûtika şilbûyî jî dikarîbû li ber tavê raxe û ziwa bike.

Gelo birîna wî di çi halî de bû? Dema birîndar bibû, çend qet hestî jê kişandîbûn û şûtika xwe li ser girêdabû. Birîn çiqasî mezin bû, çi bi xwe re biribû nizanîbû. Doh ji ber operasyonê venekiribû, lê dizanîbû ku ev bêhna ne xweş wê belayekê je re çêbike. Qet ne xerîbê vê bêhnê bû. Dema piştî hêstiran di bin bar û kurtan de çerm ji ser diçû û dibû birîn û di rêveçûnê de xwêhdan digirt, bêhneke wiha bi ser birînê diket. Wê demê yê li pey hêstirê dimeşiya divîbû xwe kêmkê deh-pazdeh gavan jê dûr bixista ku bikarîba rê ve biçûya. Ev bêhna nêmkê goştê xerabûyî bû. Gelo goştê lingê wî jî xera bibû? Ya ku lareş bigirta? Wê demê divîbû ling hatiba jêkirin. Ji xwe re got:

- “Şûna ez bi lingekî bimînim, ezê dawî li jiyana xwe bînim baştir e!” Lê ev ji dil digot an bê hemdê xwe digot, ne zelal bû. Dudiliyek di vir de jî jiyana fikir. Dilekî wî digot: “Ma ev can yê te ye ku tu bi dawî bikî?” Dilê din digot: “Ma tê bi lingekî li serê kê bibî bar, xwe bikuje çêtir e.”

Dawî hizirî ku her du nêrîn jî xwediyê rastiyeke ne, lê niha ne dema wana ye. Ji bo biryardayîna jiyana jî, bidawîkirina li jiyana jî hin zû bû. Hêviya xwe ji hatina hevalên xwe qut nekiribû. Dema heval ji cem wî çûbûn, soz dabûn ku lê vegerin. Fermandara taximê bi çavên tije gotibû:

- “Heval bes tu xwe biparêze, bila dijmin te nebîne, soz emê bi te ve werin û te bibin.”

Wî jî gotibû:

- “Heval hûn xema min nexwin. Ez wiha erzan xwe naxim nava destê dijmin. Bes hûn hevalên mane saxlem ji çeperê derxînîn, ê min ez dikarim bi kêrî xwe werim.”

Hevalê din jî gotibû:

- “Ger tu bikaribî xwe bigihinî ser keviya berfê tê xelas bibî, yan na wê sibehê dijmin sedî sed were nuqtê û divê yan tu xwe bikujî, yan ew te bikujin.”

Wê demê keniyabû û gotibû:

- “Wele nêyeta min a xwekuştinê nîne. Ew dikarin bikujin, lê wiha erzan jî ez canê xwe nadim.”

Dawî xatirê xwe xwestibûn û bi rê ketibûn. Baweriya wî bi hevala wî ya femandara taximê dihat ku wê lê vegere. Bes nizanîbû ku careke din çavên wî lê nakeve; di paşdevekişandinê de wê biketana kemîna dijmin û jiyana xwe ji dest bidaya. Xwe di cihê mirinê de hiştibû û ew rêkiribû ber bi cihê jiyane ve. Lê qedera bêbext, wekî wana bi rê ve neçûbû. Ji vana tevan bêxeber, hîn li hêviya vegera hevalên xwe bû û xwe bêbawer nedikir.

Bi her du destên xwe rahişt lingê xwe yê birîndar û bi ber xwe ve kişand, heta kaba wî gihişt ber zikê wî, bi hêdî danî erdê. Destpêkê kefiya li ser şûtikê girêdabû jê vekir û li kêleka xwe raxist, da ber tavê ku xwîna tê re der bûye, ziwa bibe.

Tav di ser Girê Darikê Kerkolê rê, ber bi Girê Stûnê Çevir ve dimeşiya û tam li raserî serê wî, wekî bêhna xwe vede, daliqandî mabû. Tîrêjên tavê di nava xwîna de diterisîn û bi biriqîna heft rengan paş de diçûn, belav dibûn. Ji xwîna hişkbûyî rengên cuda, ji ya hîn şile rengên cudatir dipengizîn.

Dest avêt şûtika li lingê xwe pêçaye. Ji jorê dest pê kir û fitlonek vekir, ber bi jêrê ve hat. Her ku serê şûtika di destê wî de dirêj dibû

bêhn zêdetir dihat. Fitloneka dawî li jêra birînê bi lingê wî ve hişk zeliqî bû. Dema kişand janê da ser dilê wî. Diranên xwe givaştin ser hev û bi carekê re jê vekir.

Şûtik da ber tavê û li ser keviran dirêj kir ku ziwa bibe. Awirên xwe zîvirandin ser birînê. Xwîn rawestiya, bû lê nêma zer girtibû ser her aliyê birînê. Parçeyên li lingê wî ketibûn qasî kefa destê wî çerm û goşt bi xwe re biribû. Parçeyê li hestî ketibû û şikandibû kunek ku bi jêrê ve diçe, li pey xwe hiştibû. Li jora birînê -buhistekê je dûr- du birînên din ên biçûk hebûn. Ji xwe bi vana qet nehisiyabû û cara yekem ev didîtin.

Kêra xwe ji bêrîka xwe derxist û ji şûtikê qetek qasî nîv metreyekê jêkir. Pişt re ji vî qetî çend terîşên zirav jêvekirin. Terîş di nava destê xwe de kir gilok û pê nêma paqij kir. Piştî rabûna nêma goştê sor û di navê re, serê hestiyên şikestî wiha spî derketin ber çav. Lê pêk re di ber hestiyên şikestî re dîsa nêma hat der.

Terîşeke din kir gilok û danî ser nêma derbûyî, hinekî dewîsand ku bikişîne nava xwe. Lê ji ber naylonbûna şûtikê, nêma nekişand xwe. Wî jî di ser goşt re bir û anî û bî vî awahî nêma ziwa kir.

Parçeyê ku çerm ji ser goşt rakiribû an jî parçeyê hestî şikandibû, rehê bingehîn ê ling radike û datîne jî qut kiribû û wekî terîşeke pehn û spî li ser goşt diterisî. Ji ber vê lingê wî ber bi jêrê ve ketibû û ber bi jorê ve nedihat. Terîşa pehn û spî, ji bo paqijkirina birînê dibû asteng. Bi kêrê di cihê zêde re jêkir û nêma girtiye binê wê paqij kir.

Êdî dikarîbû birîna xwe bipêça. Qetek şûtik jê vekir, wekî destmalekê du-sê qat pêça û danî ser birînê. Bi terîşekê girêda ku neşemite.



Pişt re nêma her du birînên biçûk ên li jora birîna mezin jî paqij kir û ew jî bi qeteke şûtikê pêçan.

Şûtika maye qasî sê-çar metreyan ji cihê ziwa jê vekir û fitlonek bi fitlonek, ji jêra lingê xwe heta jora lingê xwe pêça. Pey re kefiya ziwabûyî kir du qat û ew jî li ser birînê pêça û girêda.

Êdî operasyona wî ya yekem tamam bibû; dikarîbû bi dilekî rehet bêhna xwe veda. Dîsa bi her du destên xwe rahişt lingê xwe û di ber yê din re dirêj kir. Kefiya xwe ya din kişand ser her du lingên xwe û pal da tehtê. Ji westandinê tî û birçî bibû. Rahişt kevçiyê xwe û xwe nêzîkî keviya berfê kir. Bi serê kevçî qaşûlê ser kola û ji cihê spî gepek vekir. Li ser zimanê xwe hiland û rêkir zikê xwe. Heta ku diranên wî qerisîn jê têr xwar. Pişt re kevçî danî cihê wê û êdî dikarîbû xew bikraya. Her çiqasî nedixwest xew bike jî, ji bo bi şev hişyar bimîne, divîbû xewa xwe bişkanda.

Serê xwe danî ser kevir, cawbaranka komkirî kir balgeh û awirên xwe dirêjî bilindahiyên Dola Şumûniyê kirin. Xwest neqeba ji dolê tê xwarê û rêka jê dirêj dibe bibîne. Lê bêhûde awirên xwe westandin. Bêhneke din serê wî ket aliyekî û çavên wî çûn ser hevûdu. Pêk re jî derbasî cîhana xewn û xeyalan bû. Roj êdî gihiştibû raserê Girê Stûnê Çevir...

Li ser Girê Stûnê Çevir çend reşahî diyar bûn. Gelo heval gihiştibûn wê derê? Baş xuya nedikirin. Ger heval bin, çima evqas heşkere tevdigerin? Qey li derdorê dijmin nîne?

Pite pita baskên helîkopterekê ji dûr ve hat. Pişt re helîkopter diyar bû, ber bi Girê Stûnê Çevir ve hat û li ser gir ji ber çavan winda bû, pê re dengê wê jî qut bû. Bêhneke kurt, ne dirêj; helîkopter rabû û ber bi cihê jê hatiyê ve çû. Êdî li ser Gir zêdetir reşahî diyar dikirin.

Taximê gerîlayên jin li cihekî wiha bû ku ji ser Gir ve wekî neynikê dihat xuyakirin; lê cihê taximê xortan diket paş rizdeyekê û ji girê dijmin hatiye ser ve diyar nedibû. Hîn ku dijmin tam bi cih nebûye, divîbû taximê jinan ji wir hatiba kişandin. Lê di navbera cihê taximê xortan û cihê taximê jinan de geliyekî fireh ku tije berf hebû. Taximê jinan divîbû ji rêka Tehtên Dîkîlan Gelî derbas bikrana û bihatana ber rizdeya di navbera wê û Dola Xilxilê de bi cih bibana. Yek pey yek bi rê ketin û hatin kêleka berfê. Lê dema di ser berfê re meşiyar, lingê yekê şemitî û ket ser berfê. Ji ber ku berf req bû û serjêre bû, li cihê xwe nerawestiya û bi jêrê ve herikî, heta ji ber xwe ve rawestiya. Hîn ew ranebibû ser xwe û ji ser berfê nehatibû xwarê, yeke din û pey re yeke din şemitîn û bi jêrê ve herikîn. Êdî ti dizîbûna taximê gerîlan nema bû. Qîrên bangkirina li hevûdu diçûn ezmanan. Gerîlayên şemitîn û gindirîn li ber çavên dijmin li ser berfa spî, ber bi jorê ve hildikişiyar. Êdî pir ji xwe bawer bûn ku dijmin bi cihê wana hisiyaye.

Piştî hewildaneke bi zahmet, hevalên xwe yên jin tev anîbûn cem xwe, lê dijmin êdî planê xwe dabû ser wana. Ji rêka bi şev tê re hatibûn, ber bi wan ve, wekî rêzemorîyan leşker û cerdewan rêz bibûn û ber bi wan ve diherikîn. Ji girên derdorê jî dest bi reşandina guleyan kirin. Di bêhneke kurt de, berê sedan çekên dijmin zîvirîbûn ser nuqta wana û gule dibarandin ser wana.

Di cihekî wiha de bûn ku jêra wan bi berfê, jora wan bi lat û zinarên bilind hatibû girtin. Li vê derê ne ji bo şer, ji bo xweveşartinê mabûn. Niha cihê wan heşkere bibû û êdî di vî cihê bêkêr de divîbû heta evarî li ber xwe bidana.

- “Divê her kes şer bike, her kes mewzî bigre û guleyan berde. Ger dijmin wê neqebê derbaske, yek ji me jî li vê derê sax namîne; divê derbas neke!”

Cîgirê Femandarê Yekîneya Gerîla ji ser tehta lê kozik girtiye wiha bang li hevalên xwe dikir. Li jêra wî mangeyek gerîla bi cih bibû û devê bîkîsiya xwe dirêjî neqeba Hewşê Balê kiribûn. Dema dijmin dixwest ku wê neqebê bibore, pêlî lingê çeka xwe dikirin û ew paş de didehfandin.

Heta derengiya esir wiha li ber hev dan. Lê bi ber êvarî re du helîkopterên kobra hatin di hewara dijmin de. Cerdewanên derdor dinasîn cih ji pîlotan re bi nav kirin. Helîkopter li raserê gerîlan bilind bûn û rokêt û guleyên xwe barandin ser wana. Pişt re fitlonekeke fireh dan xwe û ji nuqtê dûr çûn. Di wê bêhnê re xeberek hat ku Cîgirê Femandarê Yekîneyê bedkujî (sûîkast) lê hatiye kirin û ji ser tehtê ketiye rûtahiye.

Dema ev salox bihîst dilê wî di cih de hat givaştin û êşek wekî birûskê da ser dilê wî. Ev zêdeyî salekê bû hev dinasîn û pêk re li Çiravê, li Bestan mabûn; rojên zor û zahmet, rojên kêfxweşî borandibûn. Bi bihîstina vê saloxê re, ji cihê xwe derket û xwe ber bi cihê Cîgir lê ketiye ve berda. Dema tehta pêşya xwe derbas kir û gihişt rûtahiye, helîkopteran careke din berê xwe dan nuqtê. Êdî derfeta wî nebû ku vegere cihê jê derketiye. Du gav li pêşya wî kevirê ne zêde mezin hebû û gerîlayekî portatîf ew kevir ji xwe re kiribû sîper. Bi lez wî jî xwe avêt pişt kevir û silav da gerîlayê portatîf.

- “Merheba heval, rewşa te çawa ye?”

- “Merheba, heta niha baş e.”

- “Kobra dîsa vegeriyan. Ezê biçûma cem hevalê Cîgir, lê keys (fersend) nedan.”

- “Dibêjin sûtîkast lê kirine. Hevalên jêrê salox rêkirin. Çend heval li wir in, nikarin biçin ser cenaze. Sax e, şehîd e jî ne diyar e. Ji ber ketiyê rûtahiyê, dijmin nahelê kes biçe ser.”

- “Min bihîst; ez jî ji bo wê hatim. Ger sax be, divê zû ji wir were rakirin ku neyê tamamkirin.”

- “Kobrayan berê xwe dan me.”

- “Nelive! Ger tu wiha bilivî û lê binêrî wê ew jî te bibîne...”

Gerîlayê portatif keys nedît ku bersivê bideyê. Bi teqîna gule û rokêtan re gotina wî di devê wî de ma. Xixiniyek ji qirika wî derket û serê wî ket ser kevir.

Destê xwe avêt milê wî û berê wî da xwe, lê bê ruh bibû. Serê wî danî ser kevir û pê re giraniyek di lingê xwe de bihîst. Dema awirên xwe zîvirandin ser lingê xwe dît ku du seriyên spî yên hestiyar, di nava xwîna sor re wekî diranên berfînî diterisîn.

Helîkopteran guleyên xwe yên dawî barandin û bi fitlonekeke fireh ji ber çavan winda bûn. Sî ket ser dolê û êdî rojê destê xwe dida êvarê. Li her du aliyan jî şer sar bibû û gerîlayên sax mane, dest bi amadekariyên paşdevekişînê kiribûn. Lê ew êdî nikarîbû rabaya ser lingê xwe. Her du hestiyên wekî du diranên berfînî serê xwe di nava sorahiyê re derxistibûn û diterisîn; bi serê tiliyên xwe yek pey yek girt û kişand, avêt wê erdê.

Rextê xwe vekir û danî kêleka xwe. Pişt re şûtika xwe vekir û li lingê xwe pêça. Xwîna pêlav derbas kiribû û ghiştibû erdê, bi pêçana şûtikê re şilahiya xwe derbasî şûtikê jî kir û heta fitloneka dawî jî şûtik şil kir.

- “Heval rabe, emê biçin.”

Keniya û bersiv da:

- "Tu biçe, ezê pişt re werim."

- "Nabe, evqas birîndar hene, şehîd hene; ma wê kî rahêje çekên wana? Divê tu alîkariyê bidî."

Dîsa keniya û lingê xwe yê pêçayî nîşan da, hevalê wî nû, wê demê xwîna li erdê ferq kir û matmayî pirs kir:

- "Heval tu çawa birîndar bûyî?"

Wî hîn bersiv nedabû, awirên wî li hevalê wî yê serê wî ketibû ser kevir û wekî di xew de be pal dabû ket û pirs xwe domand, got:

- "Nebêje ew jî şehîd ketiye!?"

Got:

- "Ma ne diyar e? Li jora milê wî binêre; nehişt ku yek peyv ji devê wî derkeve; wiha bi xixiniyekê can da."

Gerîlayê li ser lingan bêhtir matmayî û qidûmşikestî pirs xwe domand:

- "Ew kobrayên vê dawiyê rokêt avêtin wiha kirin, ne? Pîsên çeteyan di bêtêlê de cih nîşanî wan didan; yan na wana ji ku pey van lat û zinaran dinasîn?"

- "Belê. Êdî tişteki em bikin nîne!"

- "Yê te, hestî şikestiye?"

- "Rast e. Min du qet jê derxistin û avêtin vê erdê!"

Bi destê xwe qetên hestiyên hîn li ber lingê wî li ser erdê bûn nîşan da. Hevalê wî li xwîn û qetên hestiyên li erdê nêrî û paş de zîvirî, qîr da:

- "Hevaleki birîndar li vir jî heye; dema hûn hatin jibîr nekin!"

Du çek û du çenteyên pê re dan milê xwe, xatirê xwe xwest û berê xwe da jorê, meşiya. Gerîlayên din yek pey yek, pey wî re hatin û ew derbas kirin. Ên ew dinasîn silav didanê, lê dipirsîn û bi

birîndarbûna wî dilê xwe diêşandin û dişewitandin. Ew jî, dilê wî dihat givaştin û kela girî diket qirika wî. Tezînok bi laşê wî ve hildikişiyên û wekî sarî girtibe diricifî...

Ji xew veciniqî. Roj çûbû ava û sî ketibû ser dolê. Girê gira jeneratîra girê dijmin bi ser Gelî ve bilind dibû. Bayeke hênîk di ber keviya berfê re ji zozanan xwe bera jêra Gelî dida. Cawbaranka xwe ji bin serê xwe derxist û avêt ser laşê xwe. Pala xwe da tehtê, awirên xwe zîvirandin ber bi Dola Şumûniyê ve û guhê xwe li dengên xwezayê bel kir.

- “Gelo wê îşev heval werin an na?”

Pirsa xwe dîsa bi xwe bersivand:

- “Divê werin. Ji bo veşartina cenazeyan be jî, divê werin...”

Sermaya êvarî bandora xwe tam dabû ser laşê wî. Laşê wî diricifî û diranên wî li hev diketin. Cawbarank bi tevahî kişand ser serê xwe û hewil da ku bi hilma xwe germ bibe...

\*\*\*

## ŞEŞ

Geh xilmaş dibû, geh hişyar dibû. Zor dida xwe ku nekeve xeweke kûr, lê xilmaşbûn jî li xweşiya wî diçû. Bi xilmaşbûnê, bêtir dem derbas dibû. Dema hişyar dima û bala xwe dida dengê xwezayê, qet dem derbas nedibû û bêtir sebra wî diqediya. Guhên wî wiha bel dibûn ku dengê lingê bizinekê, yan berekî ji ber lingê roviyekê gêr bûbe, di cih de bala wî dikişand ser xwe û dest bi şîroveiyên dilwaswasî dikir. Gelo ber ji ber lingên kê gindirîn? Gelo heywanek bû, yan mirov bû? Gelo dibe ku heval bin? Ger heval bin, wê çawa bizanibe? Ango wê heval çawa bizanibin ku ew li vê derê ye? Gelo ti rê û rêbar dadiketin vê derê?

Baş bû ku berê digindirî li cihê xwe dima û ti berên din li pey nedigindirîn. Wê demê têdigihîşt ku ne heval in. Ji xwe re digot:

- “Ger heval werin, ne carekê, wê bi dehê caran ber ji ber lingên wana biherikin; ji ber ku ev berpâl ne li qîmê asê ne û ne xweş in. Ji xwe ev çend sal in gundî ji van deran qut bûne û lehiyê rêk tev xera kirine. Rêkên wiha asê zû xerab dibin û heval jî ti caran çênakin. Ji bo vê ger bimeşin wê sedî sed ber ji bin lingên wan bigindirin.

Çavên wî dîsa çûbûn ser hevûdu. Niv-xilmaş, nîv-hişyar bû. Laşê wî kêmekê germ bibû; êdî wekî destpêkê diranên wî li hev nediketin û ricifîna wî jî rawestiyabû. Mijankên wî hevûdu himbêz kirin û şêrînahiyek ket nava lêvên wî...

- “Bila heval beran gêr nekin!”

- “Çi?”

- “Bila heval keviran negindirînin!”

- “Bila heval beran negindirînin!”

Talimata ji serê rêzê hatibû, yek bi yek derbasî dawî dibû. Her yekî li gorî devikê xwe, awayê wê dida guherandin, lê cewherê wê ji yekî derbasî yekî din dibû. Mixabin, heta talîmat gihişt dawiyê, ji jorê dengê pengîniya berekî hat. Ber ewqas ji bilindahî diket ku di her pengizîna xwe de, herkesî dengê wê dibihîst û her du destên xwe li ser serê xwe digihandin hev ger lê bikeve serî neşikîne. Rê dizîvirî û rêza gerîla jî bibû sê-çar fitilonek. Filitandina ji ber kevirî tinebû; hey wê li ser serê hinekan biketa. Ne dikarîbûn ji rê derkevin, ne bizîvirin, ne paş de, ne bi kêlekê de biçin. Rêyeke teng ku pezkovî bi zorê dikarîbûn tê re biçin an neçin û her du aliyên wê tehtên asê bûn! Rê dema ji navbera tehtan derdiket, vê carê her du aliyên wê dibûn kevî û kevande ku kî tê re biçûba xwarê, av nedigihîşt ser laşê wî. Ji bo wê rêza gerîla pêwîst bû rêka xwe bidomîne û jê

dernekeve; êdî ber (kevir) qismetê kê ba, wê li serê wî ketiba. Berê ji jor de ketibû û hîn dipengizî, hat, hat û deng jê qut bû. Tevan guhên xwe bel kirin bê ka wê deng ji kê derkeve? Lê deng ji ti kesî derneket. Gelo li kesî neketibû? Wê demê çûbû ku derê? Bêhneke din, talîmateke din ji rêza pêş hat û têgihiştin ku çawa bûye.

- "Hevalê serê wî şikestî bila were pêş."

Ji rêza ber bi dawî ve gerîlayekî çekeke dirêj û giran li ser milê wî hewil da ku derbasî peş bibe. Lê ji ber tengbûna rê divîbû her carê hevalê li pêşya xwe rawestîne, rêka derbasbûnê jê bixwaze, bi kotekî derbas be, bigihê hevlekî din û bi vî awahî wî jî derbas bike. Karekî tevlihev û zor û zahmet bû.

Dizanîbû ku ji bo dermankirinê ew xwestibûn pêş. Bijîjkê yekîneya gerîla rêzanê vî çiyayî jî bû; ji ber vê, ketibû pêşiya yekîneyê û ger ew bi xwe paş de hatiba, dibe ku hevalên wî, di van berpālên asê de rêka xwe winda kiribana û wekî sêvên di darê de sitewiyayîne, yek pey yek di kevandeyê re biketana xwarê. Yan jî heta sibehê wê li rêkê bigeriyana û di van rûtahiyên zozanên Herekolê de, li wana biba sibeh. Ji xwe dijmin Dehrabe tev girtibû û dar bi dar dişewitand. Dibe ku pey wan de jî bihata; ji bo vê divîbû rêk şaş nekirana û heta berbangê xwe biavêtana navsera çiyê. Wê demê dibû bêminetî! Bi wana re qasî sîh şervanên nû hebûn û tev jî bê çek û rext bûn. Ger bi leşkeran re biketana pevçûnekê dibe ku darbeyeke ne di cih de bixwarina. Ji bo vê xwe ji dijmin dûr digirtin. Bi vê sedemê bijîjk paş de neçibû, birîndar pêş ve xwestibû. Lê di vê rêka teng û asê de, heta ku birîndar gihiştibû rêza pêş, serê rêze ji mêj ve gihiştibû navserê û hijmara birîndarên ji berên gêrbûyî jî bibûn sisê. Heta wê gavê, hîn talîmata hişyarkirina ji bo baldariya kevirên gêr dibin, negihiştibû gerîlayên li paş mane û xebera wan ji



tiştêkî tinebû; ji ber ku ew hîn negihiştibûn rêka asê. Li binê rêka asê gerîlayek li hêviya van hevalên xwe yên nikarîbûn xurt bimeşin mabû. Dema gihiştinê, talîmat ji wan re got û rêka xwe domand.

- “Bala xwe bidin keviran, bila ji bin lingê we nepengizin ku serê hevalên li pey we neşikînin!”

Ji xew veciniqî; berekî ji jorê gêr bibû, çend berên din jî dabûn ber xwe û bi jêrê ve dihat. Wekî xuşiniyekê dengêkî komikî li Gelî belav bû. Guhê xwe da ser deng û awirên xwe dirêjî kûrahiya nava reşahiyê kir. Tava heyvê nû dabû kiryê hemberî wî. Ezman tije stêrk bûn û ronahiya xwe berdidan ser xwezayê. Xweza bêdeng bû. Ji nava koma berê gindirî berek pengizî û ji ser tehtê firiya, li ser tehteke din ket, ji wir firiya û êdî deng jê nehat; piştî bêhneke kurt li binê dolê dengê bilind bû û têgihişt ku ber di kevandeyeke bilind re çûye xwarê.

Dengê mezin qut bibû, lê wekî hîn deng dihatin ber guhên wî, wekî hinek dimeşiyar, wekî kirte kirta axê ji ber lingan dihat, wekî bejn û bala wan jî xuya bike, çend reşahî li ber çavên wî diterisîn.

Bi piştî destê xwe her du çavên xwe bi rêzê firkandin û pişt re bi halê xwe kenîya û ji xwe re got:

- “Ma ne ku artêşek bi giştî li ser wê rêkê bimeşe û tu bi dûrbîna Sedamî lê binêrî, dîsa ji vir diyar nabe; tu çawa bi çavên rût dibînî, ev çi xwexapandin e?”

Temam, ev xwexapandin bû, ya deng? Ma deng jî xwexapandin bû? Ne carekê, deh caran li ber guhê wî ketibû, lê zû qut bibû. Ji xwe re got:

- “Ger vê carê deng bê, ezê fişengekê berdim ku bizanibin ez li vir im.”

Lê dilê wî gotina wî birî û got:

- “Tu ji ku dizanî ku heval in. Belkî çete (cerdewan) bin, hatibin nêçîrê! Belkî dijmin be, hatibe kemînavêtinê? Dema tu fişengê berdî, wê bi te bihisin û werin ser te. Wê demê tu bi destê xwe, bang li mirina xwe dikî.”

Wê demê, dudilî dibû û bala wî diçû ser guftûgoyên her du dilên wî. Yek ji yekî danedixist xwarê û yekî singek dikuta, yê din cuherek pê vedikir:

- “Derveyî hevalan kes nayê van berpalan, vê nivê şevê li nêçîrê nagere.”

- “Çete digerin, kontra digerin; ji bo bikevin çavên dijmin çima negerin? Dengê biçê hevalan, wê biçê dijmin jî.”

- “De diçe kê bila biçê, ma di vî halî de mirin xweş e yan hinek bi te bihisin?”

- “...”

Dîsa xilmaş bibû. Lê vê carê xilmaşbûna wî hinekî dirêj ajotibû. Dema hişyar bû, wî bi xwe jî têderxist ku dirêj razaye. Destê xwe dirêjî saeta xwe kir; lempeya wê pêxist û lê nêrî. Saet deh û nivê şevê bû. Êdî piştî vê saetê zahmet bû ku heval bihatana! Lê dilê wî yê bi waswas, ew rehet nedihîşt û her dikişand nava xem û gumanan:

- “Tu çi li hêviya hevalan î, heval hatin û derbas bûn. Tê bibînî piştî nivê şevê wê paş de vegezin û tê dîsa dengê lingên wan bibihisî.”

- “Na, ma kes derbas nebûye, ka bê ew deng ê guran bû, yê berazan bû, yê çi bû?”

Lê carekê kurm ketibû nava dilê wî. Ger heval derbas bibûn, wê vegeziyana jî. Ger dengê hatiyê yê wan be, di vegeze de jî wê deng derxistibana û wê demê dikarîbû qîr bidaya, dengê xwe biriba wana

ku rawestiyana. Gelo bi qîrdayînan wê deng çûba wana? Deng çûba jî, wê bawer kiribana ku hevlekî wana sax e û bang li wana dike? Dîsa çavên wî çûn ser hev, mijankên wî nerme nerme hev himbêz kirin. Hişê wî çû ser rêka ji dola Şumûniye tê.

- “Merheba heval”

- “Merheba, merheba, hûn bi xêr hatin!”

- “Me nizanîbû tu li vir î.”

- “Hevalan digotin ew şehîd ketiye.”

- “Nan û xwarin li cem te heye, me ji te re kêmek aniye.”

- “Niha tu bê cixareyî jî, ne wiha? Ka pêşî cixarekê pêbixe, pişt re em biaxivin.”

Bi carekê re ji xew veciniqî. Cawbarank û kefî bi hev re ji ser serê xwe avêtin. Li derdora xwe nêrî. Li kêleka çepê û ya rastê nêrî. Li dawa xwe nêrî û nû têgihişt ku xewn dîtiye. Di ber xwe de got:

- “Ger tu wiha bikî, wê halê te xerab be? Dev jê berde, hatin, hatin; nehatin, nehatin; an na tê hişê xwe bixwî!”

- “Ji xwe dem nîvê şevê ye, êdî kes ne tê û ne diçe. Ya baş ji xwe re binive û xewnên tewşo mevşo jî nebîne!”

Lê xewna wî ji ber çavên wî nedîçû. Gelo bi rastî wê heval bihatana û bi ser cihê wî vebûbana? Ew çi xwarin bû anîbûn? Qala cixareyê jî dikirin!?

Dilê wî qurmiçî, kurmê çixarê lebitî û serî hilda. Ji xwe re got:

- “Di rewşên wiha de, divê mirov bê tûtin nemîne!”

Lê ti derfetên peydakirina tûtinê tinebûn. Tenê milîsê wî dikarîbû jê re tûtin anîba. Xwezî cîhazek li cem hebaya. Dema dihat ku peywendiyê çêbike, wê biketa navberê û cihê xwe pê bida nasîn. Bizanîba ku ew li vir e û birîndar e, wê ew biavêta ser milê xwe û di van berpalkan de bi jorê bixista. Gelo bi rasthatinî jî di van deran re

derbas nedibû? Çawa be zilamekî bi tena xwe digeriya bû. Belkî şer bihîstibe, gotibe; ‘Ka ez biçim, belkî heval bi min hevce bin!’ û niha li van derdoran be. Belkî sibehê di vi Gelî re bi hewa keve, yan li van derdoran nivistîbe, ji xew rabe û hevûdu bibînin...

Ne xewn, ne xeyalan êdî dev jê bernedidan. Milîsê qalê dikir, bi dehê caran piştîyên qût û quruqaf jê re anîbûn navsera Kêlê. Mirovekî zîrek û wêrek bû. Bi tena xwe, piştîyê xwe hildigirt û ji gund derdiket. Merivên wî tev çete bûn, lê wî dîsa ji alîkariya xwe ya ji gerîlan re didomand, tevî ku gerîlan malbata wî qir kiribûn...

Careke din li saeta xwe nêrî. Saet dudu kêm deh bû. Êdî vê şevê divê hêvî ji her tiştî qut kiriba û binivista ku zêde hîleta xwe winda nekiriba. Wiha dihizirî ku hîn gelek roj û şev li pêşiyê hene. Dibe ku heta mirinê jî kes bi ser de nehatiba. Wê demê dikarîbû çi bikraya? Gelo wê bikarîba li ser lingekî bimeşiya? Wê lingê wî alîkarî bidayê? Ya baş ramandina her tişteki di dema xwe de bû. Ka bila ew roj bihata xwedê mezin bû!

Gelo wê xweda alîkarî dabayê? Dîsa bi halê xwe kenîya û got:

- “Ti îş û karê xwedê nîne ku bi halê te dakeve!”

Di dilê xwe de got:

- “Dema mirov dikeve tengasiyê çawa xweda tê bîra mirov!? Diyar e lawaziya mirov dike ku mirov hawarê ji her tiştî, ji her kesî hêvî bike!”

Êdî dema xewê bû; wî bi xwe jî dizanîbû ku pir tevlihev û ne rast dihizire û diaxive. Ev yek ji xwe re jî digot. Lê dîsa jî wiha ramandin û axaftin li xweşiya wî diçû; pê dema xwe diborand. Ger ne wiha baya, wê ev roj û şevên dirêj çawa derbas bibana?

Cawbarank û kefî kişand ser serê xwe û vê carê ji dil xwest xwe bike. Mijankên wî zû alîkarî danê; wekî qet negihiştibûn hevûdu, xwe li hev pêçan û bernedan.

Di xewna xwe de kanî bi kanî li zozanan digeriya. Ji her kaniyê çengeke av vedixwar. Ji derdora kaniyan tûzik, sîrik, qorat kom dikir. Di bin helizan de qîvark, li berpalan soryaz tije nava kefiya xwe dikir. Tev, hûr dikirin sênîyê, di nava rûn de sor dikir û li ber rûdinişt...

Lê çi fêde ku nan pê re hebaya wê xweştir ba!

Bênanbûnê di xewnê de jî bandora xwe didomand. Belkî çend xewn dîtî, nedihat bîra wî ku di van xewnan de jî be, têr nan xwariye. Giya pir xweş bû lê bê xwê, bi rastî jî ti tam nedida. Gelo xwê çima peyde nedibû? Ev çawa xewn bû?

Dema hişyar bû tavê ji mêj ve dabû navsera çiyê. Xewnên dîtibûn hîn li ber çavên wî bûn. Têgihîşt ku xewn û xeyal pêk re jiyane. Car caran razaye, carcaran hişyar bûye; lê her xewn û xeyalên xwe domandine.

\*\*\*

## HEFT

Sibehê zû hişyar bû, devê wî ziwa bibû. Rahîşt kevçiyê xwe û berf kola. Befir ewqas hişk bibû ku dema bi kevçî xeritand, dawiya kevçî tewiya. Tirsiya ku kevçiyê wî bişike. Teriya kevçî kurt girt ku netewe û xeritandina berfê domand heta gihişt berfa nerm. Kevçiyê xwe dagirt û bir ser zimanê xwe. Mijî û kiritand; kêmek bû av û bêtir wiha di qirika wî re çû xwarê. Şikefta devê wî hênik bû, lê wekî derzî tê rabin xuriya. Bi zimanê xwe xurand, lê êşa wê zêdetir bû. Ji xwe re got:

- “A baş ew e ku mirov dest nedeyê!” û dema rojiya birçîbûnê ya li zindanê anî bîra xwe. Wê demê jî hîn nebibû roja sisyan şikefta devê wî wiha wekî derzî tê rabin xuriyabû û goştê wê nazdar bibû.

Dilê wî dîsa çû berfê. Ji cihê kolayî kevçiyekî din vekir, bir ser zimanê xwe. Vê carê hemû nemijt; piç û piç hiland û wiha daqurtand. Dilê wî hinekî din rehet bû. Li saeta xwe nêrî. Dema berbanga sibehê bû. Xuya ye roj derketibû; lê hîn tîrejên xwe dirêjî Kela Memê nekiribû. Hîn li pişt çiyayên Zagros, li pişt çiyayê Agirî li hêviyê bû ku cîhan fitlonekekê bide xwe û ew jî bejnekekê bilind bibe; di navsera Zagrosan re tîrejên xwe dirêjî Kurdistanê bike.

Çavê xwe li derdora xwe gerand. Xwîna hişkbûyî hîn li ser tehtê bû; cih bi cih terikîbû û cihên terikî (qelişî) ji koşeyên xwe, ber bi jorê ve bilind bibûn. Şeva yekem, lingê xwe heta sibehê li ser vê tehtê dirêj kiribû û xwîn bi dilê xwe jê çûbû, herikîbû ser tehtê.

Ew bi xwe li halê xwe şaş dima ku çawa dijiya. Ewqase xwîn ji kîjan laşî çûba, wê di cih de biketa; lê ew ger ne ji lingê şikestî ba, dikarîbû rabaya û bidaya van berpalan bi saetan bimeşiya; xwe wiha zindî û bi coş didît û dihesiband. Di hundirê wî de kêfxweşiyek dilebitî. Xwîn di laşê wî de diçû û dihat û germ dibû; fikir ku bikele û bifûre. Ji xwe re got:

- “Xêr e, ez ewqasî kêfxweş im?” û hizirî. Gelo laşê wî çi bihîstibû. Hişê xwe anî serê xwe, bîra xwe vekola, lê tiştê nehat bîra wî ku serê vê sibehê pê kefxweş bibe. Dilê wî xwest avekê birijîne; ji xwe kêrî caran dirijand. Kefî û cawbarank ji ser xwe avêt kêlekê. Bi her du kefên destên xwe ji erdê hêz girt, kamaxa xwe bilind kir û danî kêlekê. Pişt re lingê xwe yê birîndar rakir û ji xwe borand. Dîsa kefên destên xwe danîn erdê û kamaxa xwe bilind kir, danî kêlekê û dîsa lingê xwe bi ber xwe ve anî...

Doxîna xwe vekir û xwe vala kir. Doxîna xwe girê da û çawa hatiye wir, dîsa vegeriya cihê xwe. Pişta xwe da tehtê, kefi û cawbarank kişand ser laşê xwe, anî li derdora qirika xwe kom kir ku serma di ber re neçe.

Tavê tîrêjên xwe yên destpêkê rêdikirin navsera Kêlê ku moriyan dest bi tevgera xwe dikirin. Awirên wî dîsa li xwîna ziwabûyî ya li ser tehtê ketibû. Koloniya moriyan doh piştî nîvro çend kifşkerên xwe rêkiribûn ser xwînê. Wê demê zêde bala wî nekişandibû, lê niha rêz bibûn û hatibûn. Serê rêzê ghiştibû ser xwînê û dawiya rêzê di nava keviran de winda dibû. Moriyên destpêkê ghiştibûn ser xwînê, kelepçeyên devê xwe di xwîna hişkbûyî û kêlekên wê yên bilindbûyî de radikirin û paşpaşkî xwe dikişandin ku qetekê jê vekin. Dema qet jê vedibû, bi paş de diketin, lê nedişiyar û zû radibûn ser lingên xwe. Li derdora xwe du sê caran dizivirîn û di kêleka hevalên xwe yên dihatin re, ber bi cih û warê koloniya xwe ve diçûn.

Di hundirê bêhnekê de rêza moriyan bibû du rêz; yek dihat û yek diçû. Her moriyên dihatin bi dilbijariyeke mezin êrîşî ser xwîna qeliştokî bûye dikirin, qet bi qet jê vedikirin û ji bo tev li qûtê xwe yê salê yên di kawarên xwe yên binerd de bikin, dibirin. Hinekan qetekî biçûk, hinekan qetekî mezin jê vedikirin; lê yek jî vala nediçûn.

Bi carekê re tezînok bi laşê wî ketin; dilê wî hat ser hev û qurmiçî. Ew coşa wî ya berbanga sibê lê bû jan. Moriyan, wekî qet ne ji xwîna li ser tehtê, ji goştê canê wî vedikirin, wiha tezînok li tevahiya laşê wî geriyan. Anî ber çavên xwe ku li ber vê keviya berfê jiyana xwe ji dest dide. Destpêkê du sê moriyên reş, ewên bêhngenî tîn ser laşê wî; dibînin ku xwîn di laşê wî de nalive û diçin bang li koloniya xwe dikin. Tev li pey hev rêz dibin û tîn ser kelaşê wî; ji lingan heta serî

tije ser bedena wî ya bê ruh dibin... Ji çavên wî dest pê dikin. Destpêkê spîka çavê wî piç û piç jêvedikin. Pişt re reşika çavê qehweyî qet qet dikin. Di wir re xwe berdidin hundirê serê wî û dadikevin ser mejiyê wî...

Di hundirê çend rojan de piçekî nahêlin. Tenê cilên wî û pêlavên wî dimînin. Radihêje cilên xwe û hildiweşîne. Hestiyên laşê wî yek bi yek dikevin ber keviya berfê. Dilê wî bi hestiyên ve dimîne. Çiqasî spî û spehî ne; yek dilop xwîn, yek piç goşt li ser nemane! Wekî bi berfê hatibin şuştin wiha berfînê diterisîn. Xwezî hilneweşandiba! Şalê xwe li erdê dirêj kir. Gumlegê xwe di jorê re raxist û her du zendên wê bi kêlekan ve vekirin. Qoqê serê xwe ji erdê rakir û danî jorê. Hestiyên stû yek pey yek rêz kirin. Polên li ser milan, mil, bazinkê dest, yek bi yek her pênc tilî, mofikên tiliyan, pişt re dest û tiliyên din, ferşê sîngê, yek bi yek tevahiya mofikên piştê, hestiyên parsûyan bi cih kirin. Hestiyê kamaxê danî binê mofikên piştê. Hestiyê rehnê rastê, pişt re yê çepê danî. Kefa kaba rastê, pişt re ya çepê danî. Hestiyê bin kabê yê rastê dirêj kir, lê yê çepê dirêj nebû... Qet û metên li wê erdê anîn ber hev, lê kêm derket. Bi ber hev ve kişand, lê negihîştin hev û valatiya di navbera wan de tije nebû! Ji neçarî aciz bû û destê xwe lê da, ji hev belav kirin; her piçek bi derekê ve pengizîn...

Janeke dijwar da ser nîvê kezeba wî. Di cih de veciniqî û destê xwe avêt lingê xwe yê birîndar. Wekî xincerek di birîna wî re rabûbe, diêşiya. Gelo çi lê ketibû? Hişê xwe anî serê xwe û têgihîşt ku dîsa ji ser hişê xwe çûbû, xilmaş ketibû. Lingê wî bê hemdê wî ji cih liviyabû û serê hestiyên şikestî di nava goştê laşê wî de çûbûn. Janê avêtibû ser kezeba wî û ji xilmaşiyê veciniqîbû.



Awirên wî li tehta sor ket. Rêzên moriyan yek diçûn, yek dihatin. Xwîn, nîvenîv kişandibûn jî. Ger bi vê lez û bezê berdewam kiribana, heta tav dida ser tehtê, piç nedihîştin. Li navsera Kêlê nêrî. Tavê tîrêjên xwe daxistibûn ser raserî Şikeftika Bihêrê. Dema rê ve hatibûn, di bin wan zinaran re meşiyabûn. Tav, wê heta nîvro li ser wan zinaran geriyaba û piştî nîvro xwe berdaba ser Gelî, ber bi esir ve jî daketiba ser laşê wî. Wê qasî saetûnîvekê li derdora wî geriyaba û pişt re tîrêjên xwe ji Gelî ber bi Şanstêrê ve kişandiba û êdî sî ketiba ser laşê wî û keviya berfê wê destê xwe daba stêrkên êvarê.

Jana dabû ser kezeba wî hîn nerawestiyabû. Têgihîşt ku lingê wî pir xerab ji cih liviyabû û hestî pir bi dijwarî di goşt re rabibû. Ew çi xewn bû ku bi destê xwe hestiyên laşê xwe rêz dikirin? Dilê wî çawa radigirt? Dema anî ber çavên xwe dîsa veciniqî û laşê wî lerizî, tezînok bi ser ketin!

Cilbarank li derdora laşê xwe pêça û mijankên çavên xwe dan ser hev. Laşê wî wiha sist bû ku serê wî zû ket ser tehtê. Bi êşa serê xwe re dîsa hat ser hişê xwe. Dilê wî nedixwest razê, lê laşê wî yê bê derman mayê, her ew dikişand cihana bêdengiyê!

Serê xwe danî ser tehtê û çavên xwe bel vekirin. Awirên xwe dirêjî kêrahiya ezmanê fireh kir. Behreke şînî şîrikî li ber çavên wî dirêj bû. Çend gilokên pembo yên li pey hev rêzbûyî di nava vê şînahiyê de gêr dibûn; wekî werin jenandin, ta bi ta belav dibûn û dîsa gilok bi gilok komî ser hev dibûn. Rêzeke ewran diçû, yek li pey dihat! Ji xwe re got:

- “Xuya ye li ezmanê reben bagereke xurt heye!

Wê demê hat bîra wî ku bager dikare baranê bibarîne û rewşa wî, ji ya ezmên rebentir bike. Destpêka biharê dihat hesabandin û

ezmanê zozanan hîn rondikên derketina ji bin cilên bûkaniyê nebarandibûn. Hîn lehî û firtone ranekiribûn û vê carê wê hemû xezeba xwe, bi ser serê wî de vala bikrana!

Li lez û beza ewrên spî nêrî. Hişê xwe hinekî da ser hev. Ev ne ewrên bager û lehiyê bûn. Lê wekî kifşkerên moriyan, saloxdar û pêşengên qiyametê bûn. Bi pey wan re, wê ewrên di rengê xweliyê de bihatana. Wê ew jî bi lez û bez bana, lê wê firehtir û girantir biçûna. Pişt re wê ewrên reş û tarî hatibana û nazdar, nazdar biboriyana. Lê dawî wê ezman tev bûba dîlê ewran û ji jana dîlketinê, wê rondikên xwe ji her du çavan bibarandana ser ruyê cîhanê. Wê cîhan tev li ber xwe biriba, ji qirêj û gemara wê şuştiba ku careke din ewrên xwe rênekira ser şînahiya wê û pêşiya wê tarî nekiriba! Piştî çend rojên ku ji girî êdî biwestaya, wê roj bihata di hewara wê de û dîsa valahiya wê ya bê sînor rengûreng biterisandiba! Mirovên lê binêriyana wê dîsa wêr jê bigirtana û hêvîdar bibana. Lê niha kê lê nêrîba, bê hêvî û newêrek dibû; qidûmên wan dişkestin û xova mirinê dilê wan diricifand.

Lez û beza ewran ber bi nîvro ve kêmbû û êdî yek pey yek rêzbûyî nedihatîn. Şînahiya ezmên her ku diçû zêdetir dibû û hijmara gilokên ewran kêmtir dibûn.

Ji nêrîna li ezmên westiyabû û birçî bibû. Ji xwe re got:

- “Tam wexta firavînê ye. Ka em vê carê jî têr bixwin, xwedê mezin e!”

Rahişt kevçiyê xwe û xwe nêzîkî keviya berfê kir. Heta têr xwar, bi serê kevçiyê xwe xeritand û bir ser zimanê xwe. Vê carê bê hijmar kevçî biribûn devê xwe. Ger qelî li ber baya, tenê bikarîba evqas bixwara! Gelo ev befir îroj çima ewqasî sêrîn bû û xweş diçû xwarê? Bi rastî jî têr xwaribû û qet xwe birçî nedidît. Şikefta devê wî jî êdî

nedixuriya û tevizî bû. Gelo diranên wî çawa bûn. Berê ku piçek ava sar diçû ser, kurmên diranên wî serî hildidan û qiyamet radikirin. Lê niha qet dengê xwe nedikirin!

Ji bêrika yelegê xwe neynika xwe derxist, qapaxa wê vekir û bir hemberî xwe. Çav li xwe ket û şaş ma. Careke din, careke din li xwe nêrî. Di hundirê sê rojan de goşt li ser hestiyên nemabû û çermê wî sist bibû; qermîçokan êrîşî ser ruyê wî kiribûn. Çavên wî di korta xwe de paş ve çûbûn. Kortên algûşkên wî kûr bibûn û hestiyên bin hinarokan dikirin ku derkevin der ve. Rîha wî dirêj bibû û tayên spî zora yê reş biribûn. Porê wî tev ketibû ser eniya wî û heta bigihê burhên wî dirêj bibû. Burhê wî yê li tehtë ketibû, hîn xwîn li ser hişkbûyî bû.

Lêvên xwe ji hev vekirin û li diranên xwe nêrî. Dema çav li diranên xwe ket şaşbûneke ji ya bêhna din zêdetir hat ruyê wî; diran wekî libên birincê spî li pey hev rêz dibûn. Cara yekem ji diranên di devê xwe de razî bû û vê carê bi rastî kêfa wî jî spehîbûna wan re hatibû. Qirêj û gemara şopa cixare û çayê tev jê çûbû û hestiyê rût ê spî mabû.

Neynika xwe pêça û xist bêrika xwe. Lêvkeniyeke sivik li ser lêvên wî ma û pê re germahiyek di dilê wî de lebitî. Ji xwe re got:

- “Ev kêfxweşiya min ne vala ye. Wê îşew heval werin cem min. Ji bo wê dilê min direqise û dicoşe!

Lê di cih de dilê wî yê bi waswas ket navberê û coşa wî lê şikand, got:

- “Tu xwe nexapîne, ne heval tên û ne jî te di binê vê keviyê de dibînin û ger bên û bibînin jî nikarin te hilgirin û di vî çiyayê kafirbav re bigihînin jorê. Ji bo wê serê xwe deyne ser tehtë û xwe ji wê dinyê

re amade bike. Destpêkê raporeke ji dil ji bo Serokatiyê binivîse; hesabê xêr û gunehê xwe bidê.”

Dîsa hişê wî tevlihev bû. Nema dizanîbû bi ya kîjan dilê xwe bike. Dudilîbûn çiqasî zahmet bû? Dawî biryar da ku guh nede yekî ji wan jî. Serê xwe dîsa da ser tehtê û berê xwe da ezmanan. Parçeyek ewrê biçûk di nivê şînahiya ezmên de berba dibû. Kêleka ewra dawî wekî terîş bi terîş –ango ta bi ta- jê vedijeniya. Awirên wî di hundirê ewrê de daliqandî man û hişê wî çû cîhana xewn û xeyalan. Tayên keviya ewrê berbabûyî, bûn keziyên porê berbabûyî yên hevala wî ya zaroktî...

Bi pey de dibeziya! Çi leyistik bû dileyistin, nema dihat bîra wî. Porê wê yê nermîn diketin ser milên wê. Hinarkên ruyê wê wekî sêva xelatî sor bibûn. Dema destê xwe gihandîbûyê lê vegeyabû û hatibûn rû bi rû. Destê xwe yê dirêjî milê wê kiribû, bi vegeya wê re li pêşêra wê ketibû û her duyan jî dabûn şermê. Lîska wan li wan herimîbû û her yek bi milekî ve çûbûn. Êdî bîr dibûn ku destdayîna pêşêrê tişteki şermîn e. Bê hemdê wî çêbibû lê mixabin çêbibû. Baş bû ku dilê wan pir dibijiya hevûdu û hez ji hev dikirin. Xeyda wan a din a rojê hatibû jibîrkirin û dîsa bi hev re di leyistikê de bûn. Lê vê carê pir hişyarî dikir ku nekeve kêmasiyeke weke ya doh. Tiqe tiqa kenê wan di ezmanan re derdiket û li ser çîmenên di navbera darên çam de pehnbûyî dimeşîyan.

Wê bêhnê zengil lêxistibû û reviyabûn refa dibistanê. Di her bêhndanê de karê wana ew bû; dihatin cem hev, dileyistin, direviyan, dikeniyên û dicoşîyan. Ger rojekê hevûdu nedîtibana dilê wan diêşîya û çavên wan li rêka hev diqerimîn...

Bê hemdê wî dîsa çavên wî çûbûn ser hev û di xew re çûbû. Di xewa xwe de li Serêkaniyê, li kêleka çemê Xabûrê bû. Ne ew tenê; hemû

refa wan li wir bûn. Lêbelê kêfa wî qet ne li cih bû; ji ber ku hevala wî jê dûr rûniştibû. Êdî hatibûn refa dawî ya dibistanê. Çend rojên din wê dibistan bi dawî bibaya. Êdî wê li der ve bixwendana. Her yek wê biçûna bajarekî û dibe ku careke din hev nedîtibana! Qet nexweş bû; xwezî ev sal qet ne meşiyaba û ev ref bi dawî nebûba. Vê bêhnê, mamosteyê refê yek bi yek bang li wana dikir, ew dianîn kêleka xwe û bi wana re wêne dikişand. Sibê jî yek bi yek wê qerneya wana bixista destê wana. Êdî dibistan bi dawî dibû. Êdî careke din hevala xwe nedidît. Gotibû:

- “Ezê biçim Rihayê, mala meta xwe. Ezê li wir bikevim azmûnan ku dibistanê bê pere bidomînim. Ger rêka te bi Rihayê ket, were serdana min, baş e?”

Di hundirê xwe de ji derd û kulan re dikeliya. Nedixwest roj bi dawî bibe. Lê mamoste li fîtikê dabû. Xwendevan tev rêz bibûn û bi rê diketin. Ew, wekî gêja lê hatibû. Jihevduketin çiqasî zor bû!?

Çavên xwe ji hev vekirin. Xwe hîn li cihê seyranê, di rojên zaroktî de dihesiband. Lê zû têgihîşt ku ew di xewna wî de maye û vegeyriya ser rastiya xwe. Tavê dabû ser laşê wî û laşê wî germ bibû. Li kêleka xwe nêrî. Tehta xwîn li ser ziwa bibû, êdî ti xwîn li ser diyar nedikir. Rêzên moriyan li derdora kevir bi awayekî gêjomêjo digeriyan. Lê pirahiya wan barê xwe hilgirtibûn û çûbûn kuna xwe.

Bi carekê re veciniqî û aqilê wî ji serê wî çû. Mêşa kesk dîsa li ber çavê wî ketibû. Gelo ji mêj ve li wir bû yan nû hatibû? Li derdora birînê dixwest deyne, lê wekî cih neecibîne vedigeriya û dîsa dihat. Bi lez xwe rast kir û dest avêt kefiya xwe. Her du guhên kefiyê kirin yek, baş pê girt û bilind kir, bi hêl danî ser mêşê. Kefî û mêş bi hev re çûn li ser birînê ketin. Careke din janê da ser dilê wî, lê ji xwe re ne kir xem. Kefî rakir û cenazeyê mêşê dît. Ewqas kêfa wî hat ku

nizanîbû çî bike. Bi baskên mêşê girt û anî, nêzîkî ber çavên xwe, lê temaşe kir. Bin zîkê mêşê tev kesk bû, serê wê reş û qehweyî bû û çiqasî bi pirç bû! Keskahiya wê li ber tavê diterisî û çrûskên zer jê dibariyan. Gelo çî taybetmendiya vê hebû ku ewqasî bi lez hêk dikirin, hêkên wê dibûn kurm û kurmên wê gav bi gav mezin dibûn? Bêhneke dirêj li mêşê nêrî şûn re avêt erdê. Lê pişt re ket dilê wî ku belkî laşê wê hêkan ji ber xwe derxîne der ve û tirsîya. Rahîşt kevîrekî û mêş bi erdê ve kuta, perçiqand û kevîr jî danî ser ku nikaribe ji binî derkeve!

Laşê wî westiya bû û westandinê ew birçî kiribû. Rahîşt kevçiyê xwe û çend kevçî berf mijt. Êdî zêde nemabû ku roj tîrêjên xwe ji Gelî bikişîne. Xewn û xeyalên gava din dîtîbû hatin bîra wî. Bi halê xwe kenîya û ji xwe re got:

- “Gelo dibe ku ez careke din dil bikevim yeke din?”

Hinekî fikirî, jiyana xwe di ber çav re derbas kir. Xeyala xwe ya herdem anî ber çavên xwe:

Şoreş bi ser ketîbû. Çekên wan li ser milên wan, dadîketin bajarên. Keçên ciwan, bi desteyên gulan ew pêşwazî dikirin. Yek ji wan destgiriya wî bû. Ber bi wî ve dihat. Gelo hevala wî ya zaroktî bû, yan yeke din bû? Ji dûr ve him dişîbiya wê, him nedişîbiyayê. Girseya gel wekî lehiyê diçelqîya û rê nedida ku bigihên hevûdu û baş bibîne.

Dîsa bi halê xwe kenîya ku van tiştan tîne bîra xwe. Ji xwe re got:

- “Halê te nebesî te ye, êdî tu li hezkirin û evîna dawîya şoreşê difikirî. Ka hele tu xwe ji vir xelaske, mala te ava!”

Cawbarank û kefî ji ser xwe avêt. Hindîk mabû pansûmana rojane jibîr bike. Lê êdî dereng mabû. Ewqas bi xewn û xeyalan daketîbû ku tav herikîbû û çûbû. Divîbû bi hatina tavê re lingê xwe vekiriba

ku qetên şûtikê ziwa bikrana. Lê niha tav ji ser laşê wî derbas bibû. Rahişt lingê xwe yê birîndar û kişand ber xwe. Lingê sax jî kişand ber xwe û rabû ser lingê sax. Serê wî bi ser keviya berfê ket. Li girê ku dijmin li ser e, nêrî. Darên elektrîkê û dîwarên kozikan xuya dikirin. Gelo niha wan jî li vê derê dinêrîn?

Dîsa li cihê xwe rûnişt. Ji xwe re got:

- “Divê heval îşev werin. Bes e. Bû sê şev. Ger çûbin ku derê divê îşev vegerin!”

Dîsa dilê wî germ bibû. Yelegê xwe derxist. Gurmê gurma dilê wî bû. Hatibû bîra wî ku bêrîkên navbera her du qatên yelek di ber çav re derbas nekiribû û sedî sed wê tûtîn tê de hebaya!

Bi rastî jî wekî fikara wî derket. Demekê çend dûvik bi şaşitî berdabûn wê derê. Pişt re ferq kiribû lê dernexistibû, gotibû:

- “Bila ji bo rojêke teng bimîne” û êdî jibîr kiribû. Niha bi carekê re hatibû bîra wî. Bêrîka xwe vekola û ji tûtina derketiye, cixareyeke stûr jê pêça. Dikarîbû bike du cixareyên zirav jî lê wer dihizirî ku çawa be wê heval bên û tûtînê jî bi xwe re bînin. Ji bo wê, cixareyek stûr wê wî heta nîvê şevê bigihanda!

Dema cixare pêxist û dûmaneke têr kişand nava dilê xwe, wekî kizîni bi kezeba wî bikeve, xurîniya wî serî hilda û dor li serê wî zîvirî, dinya li ber çavê wî reş û tarî bû. Dilê wî xeliya û hat ber bêhişmayînê. Çavê xwe girt û hilma xwe berda. Berê jî gelek caran wiha bi serê wî hatibû. Di jiyana gerîlatî de herdem derfet tinebû ku cixareyê li ser zikê têr bikişîne û dema li ser zikê birçî dikişand jî, her wiha lê dihat. Piştî bêhnekê çavê xwe vekir û hilmeke din ji cixareyê kişand. Êdî serê wî gêj nebû û nava wî zêde nekizirî.

Di nêvî de çixara xwe vemirand û danî kêleka xwe, ser berê ku moriyan xwîn jê bar kiribûn. Ket dilê wî ku divê heta nîvê şevê li

hêviya hevalan hişyar bimîne û ger heval neyên ji qehr û behcan re divê cixareyekê vexwe, dê bikaribe xwe ji bîr bike.

Êdî çavên wî li rêka stêrkan bû. Yelegê xwe li xwe kir. Lingên xwe di ber hev re kirin cot. Kefî û cawbarank bi ser laşê xwe dakir. Têr, xwarina xwe ya êvarê mijt û pal da tehtê. Çeka xwe nêzîkî xwe kir. Jerjûra wê derxist û guleyên destpêkê di ber çav re derbas kirin ku yên agirî li ser hene yan na. Lingê çekê paş de kişand, liba li ber derxist. Jerjûr lê siwar kir û libeke nû da ber. Liba berê tê de bû, xist bêrîka xwe û çeka xwe dîsa sipart tehtê. Edî bi dilekî rehet dikarîbû hatina şeveke nû pêşwazî bike...

\*\*\*

## HEŞT

Destpêkê dengê jeneratora li ser girê dijmin lê bi cih bûye, tije Gelî bû. Pişt re reşahiyê çarîka xwe girt ser berfê. Li ezmanê gewr sitêrk yek pey yek terisîn. Li saeta xwe nêrî. Heşt û nîvê êvarî bû. Roj çiqasî dirêj bibûn!

‘Gelo niha heval li ku derê bûn? Dema ji ber operasyonê paş de vekişiyabûn, xwe dabûn kîjan alî? Gelo di çend saetan de wê bikarîbana xwe bigihandana vê derê?’

Bi carekê re xuriniyek li ber guhê wî ket! Ji ser rêka berwar kevir digindirîn. ‘Gelo heval dihatin?’ Guhê xwe da ser deng. Kevir hîn jî bi jêrê ve digindirîn. Ji xwe re got:

- “Li gorî ku evqas kevir bi hev re gindirîne, tenê hirçek dikare vî tiştî bike û wekî din jî, ma heval nefiriyane ku bi ketina reşahiyê re xwe bigihînin Gelî.”

Ji xwe deng jî qut bibû. Kî dizane kevirê çawa ji ber lingê kîjan ajalî gindirîbû û di ser lat û zinarên asye re hatibû heta binê Gelî.



Bayekî hênik ji jorê ve, di ber keviya berfê re dihat xwarê. Bi roj ewqasî razabû lê dîsa jî dilê wî diçû xewê. Çavên wî ji ber xwe ve diçûn ser hevûdu. Têdigihîşt ku sedema her gav hatina xewa wî, çûyîna xwîna ji laşê wî bû. Ji ber ku ev yek dizanîbû, laşê xwe zêde nediwestan û dema çavên wî diçûn ser hev dilê wan nedihîşt.

Li saeta xwe nêrî. Heşt û çarîkek bû. Saet jî li cihê xwe rawestiyabû û nediboriya. Hûrdem (deqîqe) bibûn saet, saet bibûn roj. Roj dibûn meh, dibûn temenek. Bi rastî, her rojek qasî temenekî li ber wî dirêj û giran dihat. Gelek caran rojên dirêj, ên zor û zahmet jiyabû. Lê ev rojên li binê keviya berfê ji hemûyan dirêjtir û zor û zahmetir bûn. Çend caran ji mirinê vegeyriyabû, lê vê carê xuya ye, wê piç û piç ber bi mirinê ve biçûya.

Dîsa çavên wî, ew ji ber keviya berfê biribûn nava kursên devîyan. Êvarî ji gundê Xursê ber bi Sitewrê ve bi rê ketibûn. Heta sibehê meşiyabûn û gihiştibûn Newala Sêlê.

Sê şervanên nû bi xwe re anîbûn. Ji xwe hijmara wan jî sisê bûn. Dixwestin xwe zêde bikin ku kar û xebata xwe berfireh bikin. Lê li vî cihê peydekirina şervanan zahmet bû. Gel hîn rêxistin nas nekiribû. Hinek gund hebûn ku qet nizanîbûn heval kî ne û çî karî dikin. Hinek, ji Kurd û Kurdistanê bêxeber bûn. Hinekan gerîla wekî mehkûman dinasîn û dilê xwe bi wan dişewitandin. Digotin:

- “Mehkûmên me jî hene.”

Mehkûmên wan pirahî qaçaxên ji leşkeriyê bûn û kêmek jî mêrkuj bûn. Têkiliyên eşîrtî û yên xwînî hîn xurt û qewîn bûn.

Her êvar gundek dikirin armanc û di gund de malek didan ber xwe. Dema diketin hundirê malê zarok, zilam, jin, keç, xort tev dilebitîn û matmayî li wan dinêrîn. Yek bi yek endamên malê silav dikirin û derbas dibûn, rûdiniştin. Jin û keçên malê di cih de direviyan odeya

din. Zarok li ber derî kom dibûn. Xortên malê li ser lingan radiwestiyan û tenê zîlamê malê li huzûra wana rûdinişt û bi awirên matmayî li hêviya axavtina wana radiwestiya.

Gerîlayên çarmêrkî rûniştine, klêşa xwe di ser kabên xwe re dirêj dikirin. Her du destên xwe datanîn ser û awirên xwe li hundirê malê digerandin. Pişt re bi dengê fermanarî ji xortên li ser piyan re digotin:

- “Rûnên” û bi destê xwe cihê rûniştinê nîşanî wana didan. Xort wekî li heviya vê fermanê bûn, bê berxwedan derbas dibûn û rûdiniştin. Ew jî wekî bavê xwe, destên xwe datanîn ser kabên xwe û awirên xwe dirêjî navbera lêvên gerîlan dikirin. Yek ji gerîlan dest bi axaftinê dikir:

- “Em hêzên rizgariya Gelê Kurdistanê ne, yanê gerîlayê Serok Apo ne. Gelo hûn dizanin Serok Apo kî ye?”

- “...”

- “Serok Apo serokê Gelê Kurd e. Serokê me tevan e. Divê hûn wî binasin. Ew ji bo xelasiya we kar dike. Ew azadiya gelê Kurd dixwaze. Ji bo vê têdikoşe. We têkoşîna li Botanê bihîstiye?”

- “...”

Gundî dîsa li hev dinêrîn û bêdeng diman. Pişt re gerîlayekî din diaxift û digot:

- “Dijmin di radyoyên xwe de me wekî ‘terorîst’ bi nav dike. Lê em ne terorîst in, em Şervanên Azadiyê ne...”

Wê demê gundiyan xwe diavêtin nava gotina gerîlan û peyva wan dibirîn, digotin:

- “Wele leşker hatin gundê me jî û gotin ku ‘Hûn deriyê xwe ji terorîstan re vekin, nan û avê bidin wana, emê we bigrin û biavêjin zîndanê’. Ma bira birastî hûn Ermenî û kafir in. Leşkeran digotin ku

‘Terorîst tev Ermenî û kafir in, ji bo vê yekê qetla wana helal e û kî serê terorîstekî bîne, wê têra xwe pereyan bistîne.’”

Tezînok bi laşê gerîlan diketin. Êdî dikarîbûn çi bikin, baweriya xwe çiqasî bi malê bînin? Hijmara wana tenê sê kes bûn. Yek li ber derî ji bo nobedariyê danîbûn û dudu derbasî hundir bibûn. A baş zanekirin û bidestxistina malbatê bû. Êdî zimanê wana çiqasî bigeriya divîbû biaxivin û xwe û doza xwe bidin nasîn.

Ji dîroka mirovahiyê destpê dikirin û di dîroka Kurdistanê re derdiketin. Heta nîvê şevê li ser hev diaxiftin û bi xwe bawer dibûn ku endamên malê zane kirine û bidest xistine. Ji xwe ev çar saet bûn wiha bi hişyarî û baldariyeke mezin xort û bav li gerîlan guhdarî dikirin û serê xwe di ber re dihejandin. Êdî sedî sed têgihîştibûn ku wiha ji dil guhdarî dikirin.

Gerîlan divîbû encama axaftina xwe bizanîbana. Berya peyva xwe bi dawî bikin, li nîvê çavê bavê malbatê dinêrîn û dipirsîn:

- “Ma ne hûn têdigihêjin ku em çi dibêjin?”

Wê demê bav, di cihê xwe de dihejiya û bi awayekî ji xwe bawer dibersivand:

- “Wey, çawa em tênegihêjin! Tiştên hûn dibêjin tev rast in û ji kitêbê ne. Lê wele bê fêde ye; heyfa we xortên ‘terorîst’ hûn li serê van çiyar in. Kurê min, em Kurd nabin însan. A baş ji xwe re rûnên, bizewicin, li rehetiya canê xwe binêrin. Çi ji we re lazim e Kurd û Kurdistan? Pêximber aleyhûselam gotiye, ‘Kurd nabin zilam’. Wele ti ji me çênabe. Hema dev ji me berdin çêtir e.”

Wekî tu şerbikek ava sar bi ser gerîlan dabikî şaş diman. Axaftina wan a çar saetan di guhekî re ketibû, di guhê din re derketibû û yê gundî dîsa ya di dilê xwe de gotibû. Êdî dem jî nemabû ku careke din vegezin serî. Dema radibûn ser xwe ji xortê malê hinek nan û

pêxwarinê dixwestin. Xortê malê awirên xwe dizîvirandin ser bavê xwe. Bav diqêriya:

- “Lez ke kurê min, hinek nan û pêxwarinê bide van feqîran, guneh in...”

Gerîlan nizanîbûn çî bibêjin. Dema ji gund derdiketin ji aliyekî ve bi halê xwe digiriyan û ji aliyekî ve pê dikenyan. Lê ji xwe bi hêvî bûn ku bi serkevin. Ji bo vê şeveke din diçûn gundekî din, an maleke din. Dîsa çar saetan diaxiftin ku mirovekî bidest bixin...

Dawî têgihiştîbûn ku bi rêka zilaman nikarin malbatê bidest bixin. Lê çawa? Dema diketin hundir keç û jin direviyan odeya din û heta ku diçûn çavên wana li yekê jî nediketin. Zilaman jî guhdarî dikirin û digotin:

- “Ti ji me çê nabe! Em Kurd xayin in!”

Biryar dan ku gerîlayeke keç bi xwe re bigerînin. Lê, gelo dikarîbûn ji ku derê peyde bikin? Gerîlayê berya wî li herêmê bû got ku ‘dikarin biçin ji Xursê bînin’. Xurs ji berê ve nasdarê gerîlan bû û li wê derê ciwanên dilxwaz hebûn. Ji bo wê hêza xwe ya gerîla -ku nîvê tevahiya hêza li herêmê bû, nêvî rêkiribû deştê û nêvî li çiyê li cem xwe hiştibû- girtibû û berê xwe dabûn Xursê. Sê rojan li ber ava Xursê û di nava tehtên çiyayê wê de mabûn. Dawî di rêka şivanan re tekilî bi gundiyan re danîbûn û li mala dayikeke xwedî şehîd bibûn mêvan. Gelek xort û keçên ciwan ên gund bi hatina wana hisiyabûn û hatibûn serdana wan, digotin:

- “Heval, ji mêj ve kes bi ser me ve nehatiye, qey heval bi ku ve çûne. Em zêdeyî deh kesan amade ne ku derkevin serê çiyê, lê kes nîne û niha jî pêşiya me cejn e. Piştî cejnê werin û me bibin.”

Di wê bêhnê re gerîlayê berya wî hatibû herêmê -ku li der ve bi ciwanan re diaxift- çav lê kir û bang kir der ve. Dema çû der ve got:

- “Sê keç hene dixwazin îşev bi me re werin. Ger neyên dibêjin emê xwe bikujin, ji ber ku ev salek e li heviya hevalan in ku wana bibin.” Ew jî li tiştêkî wiha digeriyan. Lê her sê keç jî ji malbata şehîd bûn û ev zor bû. Ji bo wê nexwest ku wana bi hev re bibe. Lê keçên ciwan xwe kirin erd û gotin:

- “Em bimrin bi hev re, bimînin bi hev re ne. Me soz daye ku em ji hevûdu veneqetin û ger hûn me nebin ehd li me be ku em di îşev de xwe bikujin.”

Ji neçarî hatina wana pejirandibû. Dizanîbû ku dayika şehîd wê pir dil bi kul bibe. Lê mixabin şoreş bû; mirovek bixwaze xwe tevlê bike, mafê mirovekî din tinebû ku pêşî lê bigre.

Derengiya şevê xatirê xwe xwestibûn û ji malê dûr ketibûn. Wekî biryar kiribûn her sê keç li derveyî gund li hêviya wana bûn. Êdî hijmara wan bibû, şeş. Xwe wekî artêşekê bi hêz dihesibandin. Dema Newala Sêlê qut kirin û li ser Kaniya Bîrikan metereyên xwe dagirtin, hinek nokên hişîn jî çinîn ku sibehê bixwin. Ewqas bi heyecan û coş bû ku di wê navberê de çû ser depoyê û sê çekên berya demekê ji cerdewanên dijmin sitendibûn, derxist û anîn cem xwe. Ji şervanên nû re got:

- “Niha razên, sibehê emê we perwerde bikin. Va ye çekên we, bixin bin serê xwe.”

Şervanên nû bi kêfxweşiya gihiştina çekan serê xwe danîbûn ser û wê gavê di xew re çûbûn. Ji xwe ji berbanga sibehê re gelek nemabû. Lê ewqasî rê meşiyabûn û westiyabûn ku bi kotekî xwe li ser ligan digirtin.

Bi berbanga sibehê re hevalê wî yê nobedar –ku şervanekî yek mehî bû- deng lê kir û got:

- “Heval ka rabe hinek li derdora me bi Tirkî diaxivin!”

Di cih de veciniqî û got:

- "Zû deng li hevalan bike, dijmin li dora me ye. Te çima ji mêj ve negot?"

- "Heval nû dengê wan hat."

- "Zû wana hişyar ke!"

Destê xwe avêt çeka xwe û hesinê ewlekariyê daxist xwarê. Hevalên wî hişyar bibûn û rabibûn ser xwe ku tiştên xwe kom bikin. Bang li wana kir û got:

- "Kes nerabin ser ligan, di cih de rûnên!"

Lê hîn gotina wî di dev de, tifingên dijmin agir barandin. Di cih de berê klêşa xwe da cihê agir jê bariyaye û tiliya xwe danî ser lingê wê. Heta ku leşkerê di armancê de li ser piştê neket erdê, tiliya xwe ji ser lingê wê ranekir. Hevalê li cem sax maye jî jarjûrek li derdora xwe reşand.

Bêhna xwîn û barûdê tije bêvila wî bû. Rojê di cih de serî da der û rojêke dirêj a havînê destpê kir. Rahişt çeka xwe û rabû ser xwe. Li hevalên xwe nêrî. Hevalê berya wî hatibû herêmê, di nêvî re hatibû birîn û nikarîbû rabe ser xwe. Du, ji şervanên nû bê can li erdê komî ser hev bibûn. Destê her duyan yek bi yek rakir û berda. Di roja yekê de jiyana xwe ji dest dabûn. Vegeriya cem hevalê xwe yê birîndar. Rondik tije çavên wî bibûn û hew dizanîbû çî bike. Bi destê hevalê xwe girt û got:

- "Heval rabe em biçin!"

Hevalê wî destê xwe kişand û got:

- "Ez nikarim bimeşim. Hûn biçin û xwe xelaskin. Ez ê mirinê mê!"

Rondikek ket ser hinarkê ruyê wî û daket erdê. Careke din got:

- "Heval em biçin!"

Hevalê wî destê xwe dîsa kişand û got:

- “Hûn xwe xelaskin ku bikaribin tola me bistînin. Hinekan îxbariya cihê me kirine. Ger hûn zû neçin, hûnê jî werin kuştin!”

Wê bi kîjan alî ve biçûna? Ew bi xwe jî nû hatibû herêmê û hîn erdnîgariya wê ji hevûdu dervedixist. Hevalê ku herêm dinasî yê birîndarbûyî bû, ew jî ji nawqê hatibû birîn û nikarîbû piştta xwe rast bike. Ji hevalên xwe yê sax mayî re got:

- “Bikevin pey min û qut nebin” û berê xwe da ser kaniyê. Ji ber ku bi destpêkirina teqîna guleyan re dev, lêv û qirika wî tev ziwa bibû. Şerê di derbasbûna sînora de ger nehatiba hesabandin ev şerê wî yê yekem bû ku bi dijmin re sînge sîng dihat hemberî hev.

Li ser kaniyê du sê çeng av vexwar û di nava kursan re berê xwe da dolika bi milê rastê ve hildikişiya. Piştta xwe dabû milê ku gule jê bariyabûn. Bi vî awahî dihizirî ku çepera dijmin biqetîne û jê dûr keve.

Tav çiqasî jî dijwar bû; hîn deh gavan neçûbûn, xwêhdanê di pehniya wana re avêtibû û lêv û devê wana ziwa bibûn. Bêaqilî kiribûn ku metereyek av bi xwe re ranekiribûn. Divîbû xwe bigihînin avê. Lê av li ku derê bû? Ê ew bi xwe bi ku derê ve diçûn?

Girê yekem qulipîbûn. Gelo dijmin ew dîtibûn? Gelo bi pey wan de dihatin? Niha deşteke fireh li ber wana dirêj dibû. Divîbû di kêleka deştê re bimeşin ku li rastahiyê nebin armanca dijmin. Berê xwe dan milê çepê û leza xwe domandin. Di fitlonekê de deşt li ber wana firehtir bû û li malbateke gundî rast hatin. Zilam, jin û zarokek li nava erd bi bêjîngkirina zad ve mijûl bûn. Sedî sed niha li cem wana av hebû. Gundî jî çav li wana ketibûn û dev ji karê xwe berdabûn.

- “Mamo hinek av bidin me, em fetisîn.”

Zilam ji erdê rahişt metere û dirêjî wî kir. Jina malê bi meraqeke dilşewat pirsyarî kir:

- "Hûnê bi ku ve biçin kurê min? Ew çi dengê tifingan bû? Qey hûn ji şer tên?"

- "Rast e dayê. Em bi dijmin re ketin şer û niha divê em xwe jê dûr bixin."

- "Qey hûn van deran nas nakin kurê min. Wê wiha berê xwe daye qereqolê û hûn dilezin. Ma ne ku hûn vî girî biqulipin, qereqol li pêşya we ye!

Nû hişê wî hat serê wî. Berê jî bihîstîbû ku li van aliyan qereqolek hebû. Wê demê ketibûn navbera du qereqolan. Dijmin li pey wan mabû. Pêşya wan vekirîbû lê nas nedikirin. Ji xwe re got:

- "A baş em xwe nêzîkî qereqolê bikin û veşerin. Dijmin li ber pozê xwe nagere. Ger em çiqasî bimeşin, emê ewqasî bibin hedef."

Li aliyê qereqola li paş gir nêrî. Erdê wê rût bû. Lê aliyê qereqola din têt dar bû. Ji yê gundî re got:

- "Mamo vî metereyê avê bifroşe me. Heqê te çiqas be em bidin!"

- "Metere li we xweş helal be kurê min. Hûn xwe xelaskin, qiymetê metereyek av çi ye? Em dikarin heta êvarî bi yek metereyî îdare bikin. Hûn bibin li we xweş helal be!"

Bi van peyvan germahî û wêr ket dilê wî. Rahişt metere û berê xwe da erdê têt dar. Bêhnekê meşiya û fitlonekek da xwe, berê xwe da warê qereqola dijmin. Bêhneke din meşiya û hat cihekî têt dar. Li wir rawestiya û ji hevalên xwe re got:

- "Emê li vir bimînin. Razan û xew nîne. Kes ji cihê xwe jî nelebite û bê xebera min tişteki neke."

Vegeriya ser hevalê xwe yê yek mehî û got:

- "Hinek katên çilo jêke û deyne ser serê xwe. Biçe ser vê dara bilind." Bi destê xwe dara çend gavan ji wana dûr nîşan da. "Dema



te tiştekek dît qîr nede. Kevirekî biavêje jêrê, emê pê bihisin û nehêle ku hinek te bibînin. Dûrbîna te jî bila neterise!”

- “Baş e, heval,” gotibû şervanê yek mehî û derketibû ser darê; ji erdê çengek ber jî kom kiribûn û xistibû bêrîka xwe...

Bi gindirîna keviran ji xewê veciniqî. Ji jorê, cihekî dûr ve berên hûr digindirîn. Ji dengê dibihîst, wiha dihizirî ku berên hûr in. Guhê xwe da ser deng. Deng didomiya. Destê xwe bir ser saeta xwe. Lempeya wê pêxist û lê nêrî. Saet neh û nîvê şevê bû. Ev saet û nîvek bû ku reş ketibû erdê. Ji bo hatina hevalan tam dema xwe bû. Gelo ew bûn?

Dilê wî kir gurme gurm. Laşê wî germ bû û xwe di cih de nedigirt. Xişte xişta kevirên hûre qut nedibû. Wekî hinek rê ve diçûn û di her gavavêtinê de diçerixîn. Ji ber ku hîn tava hîvê derneketibû berpâl reş bû û mirov nikarîbû rêka xwe bibîne. Gelo ji ber wê diçerixîn û deng ji ber lingên wana derdiket?

Deng geh nêzîk dîbû, digot qey ber bi wî ve tê û geh jê dûr dibû. Lê nedişibiya dengên doh û pêr bihîstibûn. Ew dengên din carekê xurîniyek derdixistin û winda dibûn, lê ev her didomiya. Ji xwe re got:

- “Ger ne heval bin, kî ne?”

- “Gelo dijmin dîsa derketibû operasyonê?”

Lê ev saet ne dema rêveçûna dijmin bû. Çi karê dijmin li wê berpâlê hebû? Dijmin wê bihata, navser bigirta û bi sibehiyê re xwe berdaba berpâlê. Wê demê ev heval bûn û ne kesekî din bûn. Him ger ev ne heval bana ma dilê wî wiha bi lez lê dida û xwîna wî wiha di laşê wî de dikeliya?

Devê xwe vekir û heta jê hat bang kir:

- “Hevaaaalll..!”

Dengê wî çû û li bin guhê lat û zinaran ket û parçe parçe lerizî, lê vegeriya. Li bersiveke were dayîn guhdarî kir, lê ti bersiv nehat. Bes xişte xiştê deng didomiya. Careke din hêz da xwe û bang kir:

- “Hevaaaalll..!”

Dîsa li çûnûhatina dengê xwe guhdarî kir û li hêviya bersivdayînê ma. Lê dîsa ti bersiv nehat. Guh da ser xişte xiştê. Lê êdî xişte xişt jî qut bibû.

Gelo çî bibû? Dengê wî kiribûn an na? Gelo derbas bibûn û çûbûn? Qey ketibûn kêrahiya serê Gelî, pişt lat û zinaran ku careke din ne dengê wan were û ne dengê wî biçê wana! Çima dengê wana qut bibû. Gelo bihîstibûn û tirsîyabûn? Belkî bawer nedikirin ku heval bang li wana bikin. Belkî ji bo xwe biparêzin rawestiyên û dengê xwe birîn!

Niha dikarîbû çî bike? Her roj heval nedihatîn ku bihêle sibê. Careke din bang kir:

- “Hevaaaallll...! Hevaaaalll..!”

Dîsa guhdarî kir û dîsa ti bersiv negirt. Xişte xiştê dîsa destpê kiribû. Êdî tam baweriya wî rûniştibû ku heval rê ve diçûn. Baş dizanîbû ku dengê wî heta ber guhê wana diçû, li ber guhê wana diket, lê nedigihîşt guhê wana. Ji ber wê rawestiyabûn û guhdarî kiribûn. Dema tiştê nebihîstibûn dîsa meşiyabûn û xişte xiştê qut bibû, dîsa destpê kiribû.

Wê demê dengê bilindtir divîbû. Ya baş teqandina çekê bû. Lê dibe ku deng biçûba dijmin jî. Wê demê bi destê xwe li xwe mukur dihat! Bi rastî di rêveqetîneke zahmet de bû. Baş dizanîbû ku têkiliyê bi hevalan re çêneke êdî careke din çavê wî li hevalan nediket. Lê, navbera wî û girê dijmin li ser e jî, ji rêveçûna guleyekê ne dirêjtir bû û wê deng çûba wana.

Di navbera du biryaran de çû û hat. Di wê bêhnê de wekî ba xurt bû û dengê jeneratorê zêdetir gihand guhê wî. Kêfa wî hat ser û ji xwe got:

- "Dengê jeneratorê nahelê ku teqîna guleyan bibihîsin."

Baweriya xwe bi vê ramanê anî û berê çeka xwe da navsera Dola Şumûniyê. Hesinê ewlekariyê vekir û tiliya xwe bir ser lingê wê. Yek, du, sê.

Sê lib li pey hev rêkir valahiya şevê. Hesinê ewlekariyê girt û çeka xwe danî kêleka xwe. Êdî ji rawestinê bêtir tiştê bike, nemabû. Guhê xwe da ser reşahiya şevê. Xişte xişta deng dîsa qut bibû. Şev kerr û lal bû.

Dilê wî dihat givaştin û sar dibû. Tezînokên cemidî bi laşê wî ve hildikişyan. Dilê wî dixeliya. Nava wî dikizirî. Ruyê wî diqurmiçî.

Destê xwe li ser ber peland. Dûvikê çixarê hat destê wî. Bir nava lêvên xwe. Destê xwe avêt bêrîka xwe. Heste derxist ku pêxe. Lê destê wî wiha li jorê daliqandî ma.

Ji binya navsera Dola Şumûniyê teqîna guleyekê bilind bibû. Li hêviya teqîneke din rawestiya, lê nehat. Careke din rahişt çeka xwe û vê carê guleyek berda hewayê.

Li hemberî guleya wî guleyeke din teqiya. Êdî dilê wî rehet bû. Çeka xwe danî kêleka xwe. Cixareya nîvçe hîn di nava lêvên wî de bû. Xwest ku pêbixe. Lê hesteyê wî ne di dest de bû. Ji kêfa bihîstina teqîna guleyê re, kî dizane danîbû ku derê? Bêrîkên xwe yek bi yek vepexirandin. Ne tê de bû. Li ser cawbarankê nêrî, ne li ser bû. Li erdê , li ser ber destê xwe peland, ne diyar bû. Neçar ma, cixareya xwe careke din danî ser ber û guhê xwe da ser dengê şevê. Xişte xişta deng dîsa destpê kiribû. Êdî sedî sed bi bawer bû ku heval ber bi wî ve dihatin...

Tava heyvê nû ronahiya xwe dida ser Dola Şumûniyê. Gelo wê di çend saetan de bihatana xwarê? Êdî zêde ne grîng bû. Pala xwe da tehtê. Cawbarank ji nû ve li ser laşê xwe pêça û mijankên çavê xwe birin ser hev. Xewn an xeyala bîranîna wî ya gava din hat ber çavên wî.

Ji çepera dijmin filitîbûn, lê nizanîbûn ku çi bi serê wana hatiye û wê bi kîjan alî ve biçin? Bi şev çûbûn û li nava kursên deviyar bi cih bibûn. Dijmin piştî hatina wan bi du-sê seatan bi ber wana ve meşiyabû. Sîngê sîng gule reşandibûn ser hevûdu. Nîvê hijmara wana jiyana xwe ji dest dabûn. Ew çawa filitîbûn, hîn nizanîbû. Lê çi karê dijmin li wir hebû? Dijmin çawa dizanîbû ku di nava wê kursê de ne?

Hişê xwe anî serê xwe. Rêkên ev çend roj in tê re diçûn û dihatin anîn bîra xwe.

Rêk şopandin û çûn gundekî li ser rêka ziftê. Li wir çûn malekê. Hinek nan û pêxwarinî û du metere av girtin. Ji gund derketin, li dora gund zîvirîn û rêka ziftê qut kirin. Li wî milê rêkê daristaneke tarî hebû. Meşiyar kûrahiya daristanê û pal dan erdê. Ji hevalên xwe re got:

- “Li gorî ez dizanim, ew milê rêkê xaka Sitewrê, ev mil jî yê Çiyayê Mazî ye. Wê dijmin sibê derkeve operasyonê û destpêkê bi wî milî ve biçê. Ji bo wê serê sibehê kî hişyar be, bila li ser rêkê binêre û erebeyên leşkerî bişopîne. Niha xew serbest e. Em hemû zêde westiyar.”

Sibehê her sê jî hişyar bûn û çavên wana li ser rêka ziftê bûn. Bi rastî jî wekî gotina wî derdiket. Konwoyeke leşkerî hat gundê şevê din çûyîne û berê xwe dan milê jê hatine.

Heta êvarî li cihê xwe man. Ber bi êvarî re dîsa bala xwe dan ser rêkê. Konwoya leşkerî ji operasyonê vejeriya û rêka ziftê derbas kir, hat li gundê li milê wana rawestiya. Ji hevalên xwe re got:

- “Êdî divê em bêhneke din rabin û biçin wî milê rêkê. Sibehê wê operasyon li vi milî destpê bike.”

Dema reş ket erdê, xwe berdan xwarê û zift qut kirin. Wê şevê heta sibehê meşiyar û xwe gihandin Newala Sêlê. Di nava baxçeyên gundiyan de ji xwe re cihekî xewle û tarî dîtin û pal dan erdê. Sibehê dema roj bilind bû xwediyê baxçe hat cem wan, ji ber ku hevûdu dinasîn. Nivîsarek nivîsî û da xwediyê baxçe ku bi lez bibe deştê û hevalên rêkirine wir vejerin. Pêdiviya wî êdî bi wan hevalan hebû ku wana herêm baş nas dikirin.

Çend rojêke din hevalên wî dihatin. Hevûdu didîtin û diçûn gundên derdorê. Pirsyarî ji gundiyan dikirin û têdigihîştin ku ji gundê Tizyan ixbarî li ser wana çêbûye. Ew sê şev bûn ku dijmin li cihê şer kemîn danîbû pêşiya wana. Ew jî hatibûn û di nava kommoza dijmin de nivîstibûn. Dijmin ji berê ve li wîr bû; bi hatina wana hisiyabûn û li hêviya sibehê mabûn. Sibehê jî bi bêtêlan xeber dabûn hev û bi ser wana de meşiyabûn. Dema her sê gerîla rabibûn ser xwe çav li wana ketibûn û pêlî lingê çêkên xwe kiribûn. Lê dema dengê klêşa gerîla bilind bibû, xwe avêtibûn erdê û careke din sere xwe ranekiribûn. Êdî dizanîbûn ku kê ixbarî li wana kiriye û bûye sedema şehîdbûna her sê hevalên wî. Her du keçên nû tevlêbûne ji ber çavên wî qet nedîçûn. Dema vekîşiyabû, bi zanabûn ranehiştibû çeka wana ku dijmin bi awayekî din bikar neyne û wana wekî gerîlan bipejirîne. Hevalê wî yê din jî gotibû; ‘tola me bistînin’. Êdî dema tolhildanê bû. Komek hevalên xwe rêkir gund. Îxbarker di malê de girtin. Anîn derveyî gund û devê tîfingê raserî serê wî kirin...

Dengê li ber guhê wî ket. Ji xewn û xeyalan veciniqî. Belê hinekan bang lê dikirin:

- “Heval tu li ku yî?”

Hevalên wî bûn. Nêzîkatî lê kiribûn û li cihê wî pirsyarî dikirin. Devê xwe vekir û bersiv da:

- “Ez li vir im, ez li vir im...”

Pişt re bi bersiva xwe keniya û careke din bang kir:

- “Li paş keviya berfê, li paş keviya berfê.”

- “Temam, tamam, em tên.”

\*\*\*

NEH

Gelo kîjan heval bûn? Ji dengê wan nas nekirîbû. Vê şevê jî daketina Gelî qet nexweş bû. Hatina rê û rê dîsa hinekî hêsan bû; lê jirêderketinê û şûn de pir xerab bû. Zinarên bilind û tûj di her derê re rê nedidan. Cihên rê didan jî tije berhûrik bûn ku mirov hinekî gava xwe fireh biavêta, di cih de dişemitî û ber ji ber lingên wî digindirîn.

- “Heta em bi ser vir vebûn, em ji hal ketin.”

Hevalên wî hatibûn milê din ê keviya berfê û pê re diaxiftin.

- “Emê çawa werin cem te, rêk der hene?”

- “Divê hûn berfê qut bikin, rêk nînin.”

- “Tu çawa hatiyê vê derê ya rebî!”

Hevalên hatine ling dan ser keviya berfê. Berf hişk bibû û serjêreyî bi mêyl bû. Dîtin ku hinekî gava xwe bê hemd biavêjin, wê bişemitin û biçin. Ji bo wê bi serê lingê xwe, cihê lingê xwe kolan û wiha derbasî cem wî bûn.

- “Em bi kotekî derbas bûn; ne berf e, cam e mîratê.”

- “Ka tu li ku derêyî?”

Hatibûn raserî wî, ser keviya berfê. Lê ji ber ku binê keviyê reş bû hîn ew nedidîtin. Lê wî ew her du jî bi rehetî ditîtin. Deng li wana kir:

- “Hema xwe biavêjin xwarê, ez li jêra we me.”

Her du gerîlan du-sê gavan serjore meşiyar û xwe berdan erdê.

- “Merheba heval!”

- “Merheba, hûn bi xêr hatin!”

- “Di nava xêrê de bî. Rewşa te çawa ye?”

- “Baş e. Hûn çawa ne?”

- “Em jî baş in. Lê heta em daketin vê derê, çavê me derket. Tu çawa hatiyî vê derê?”

- “Çîroka wê dûvdirêj e. Hele ka rûnên. Rewşa hevalan çi ye? Di paşdekişandinê de hûn saxlem derketin?”

- “Hevala femandara taximê şehid ket, du heval jî sivik birîndar bûn. Lê wekî din tev saxlem derketin.”

Bi bîhistina vê saloxê dilê wî di cih de qurmiçî. Anî bîra xwe ku dema birîndar bibû, hevalên wî tev bi rêketibûn, dawî ew femandara taximê hatibû cem û xwestibû wî rake bibe. Lê dema gotibû:

- “Hûn biçin hevalan xelaskin, ez nikarim bi we re bêm,” çavên wê tije rondik bibûn û gotibû,

- “Tu xwe biparêze, ez soz didim ku çawa em ji çeperê derkevin, ezê hevalan rêkim û te ji vir bigrim.”

Baweriya xwe bi vê sozdayînê anîbû û ev sê roj bûn, bi vê hêviyê dilrehet bû. Niha têdigihîşt ku çima hevalên wî zûtir pê ve nehatibûn. Ji hevalên xwe pirsî:

- “Hûn çima doh, pêr nehatin?”

- “Me nizanîbû tu filitiyî. Hevalan digotin lingê wî şikestiye, di nuqtê de mayê. Ji xwe me digot an te bombe bi xwe de teqandiye, yan jî dijmin te şehîd xistiye. Em ne ji bo te hatibûn. Emê derbasî nuqtê bibana ku cenazeyên hevalan veşêrin. Lê dema te çek teqand me got, ‘wele dibe ku hinek hevalên birîndar bin’, -ji ber ku hinek heval di paşdevekişîne de ji me veqetiyabûn û hîn jî negihiştine me- me got, ‘dibe ku ew bin, birîndarên wana hebin, nikaribin rêve bîn, li van deran mabin’. Ji bo vê me bersiv da te. Bi rastî qet nehat bîra me ku tu sax filitîbî.”

- “Min got ku dûvdirêj e, lê ez bi xêra vê berfê filitîm. Min xwe gihand ser berfê û şemitand.”

- “Wele min texmîn dikir. Mirovê saxlem nikare li van deran bimeşe, yê lingşikestî wê çawa bimeşe? Fêda berfê jî ev e.”

- “Ê, dev ji wê berde. Ka emê çawa te bibin? Divê em lezkin, sê saetan em bi jorê nakevin.”

- “Divê em biçin cenazeyan jî veşêrin, ku bimîne sibehê, wê bîn pêbikeve.”

- “Ma tenê hûn du heval hatine?”

- “Rast e.”

- “Wê çaxê biçin cenazeyên hevalan veşêrin û sibê wêrin min bibin. Hûn îroj nagihên her du karan bi hev re bikin.”

- “Rast e, lê em dikarin îşev te bibin jorê, sibê werin cenazeyan veşêrin, çi nabe.”

- “Hûnê çawa min bibin? Ka darbest?”

- “Bi piştê emê bibin.”

- “Zahmet e!”



Bi rastî jî ne karê aqilan bû ku yek bikaribe bi piştiyekî giran di van kevandeyên têr berhûrik de bi jorê keve. Her du gerîlan jî li ser xwe bûn, ciwan bûn, lê erd ne ti erd bû û evrazekî nexweş bû.

Alîkarî danê û hilgirtin ku yek bide pişta xwe. Lê dema lingê wî ji cih leqiya, wekî xinçer di laşê wî re rabin janê da ser kezeba wî û got:

- “Heval wiha nabe. Ger ez werim pişta we jî, her gavê wê hestî bileqe û jana wê biavêje kezeba min. Ne hûn dikarin wiha bibin û ne jî ez dikarim li ber xwe bidim. A baş hûn biçin karê xwe bikin, şeveke din darbestekê bigrin û werin.”

Her sê heval li hev rûniştin û her yekî di vê derbarê de nêrîna xwe gotin. Dawî biryara xwe kirin yek ku her du gerilan biçin ser karê xwe û vegerin nuqtaya jê hatine. Saloxê bigihînin yekîneya gerîlan û şeveke din bi amadekarî û çend hevalan ve werin wî bibin.

Hevalên wî rabûn ser xwe ku xatirê xwe bixwazin û biçin. Ji ber ku çenteyên wan ne li pişta wana bûn, dizanîbû bi wana re xwarin nîne û ji bo vê yekê jî qet qala xwarinê nekiribû. Lê dibe ku bi wana re kêmeke tûtin hebaya. Pirsyarî kir û bersiva qet nedixwest bibihîse, lê vegeriya:

- “Wele piç nîne; ji operasyonê û vir ve tûtin bi çavê kesî neketiye. Rastî, tu çi dixwî, xwarin û vexwarina te heye? Derman der li cem te heye?”

- “Tiştêk nîne; ev sê roj in ez bi berfê xwe têr dikim. Birîna min jî tev nêm girtiye. Dema hûn bîn, hinek derman jî bi xwe re bînin baş dibe.”

- “Şansê te xerab e ku me çenteyên xwe li serê Dolê hiştin. An na me dikarîbû qetêke nan bidaya te. Lê sibe êvarî emê hevalan jî rêkin, xwarinê û dermanan jî rêkin.”

- “Hevalê textor jî dikare were. Bila birîna te pansûman bike û baş bipêçe, tê bêtir bikaribê li ber xwe bidî.”
- “Êdî hûn dizanin. We rewş bi çavan dît. Silavan li hevalan bikin.”
- “Ser çavan.”
- “De bi xatirê te”
- “Baldariya xwe bike, çawa ku em bigihên nuqtê, emê hevalan rêbikin.”
- “Baş e, de oxir be ji we re. Rastî hindik mabû ez ji bîr bikim; hevalên çûbûn gund hatin?”
- “Kî? Femandar ew?”
- “Belê.”
- “Na wele hîn nehatine. Wana jî bihîstine ku heval şehîd ketine û operasyon didome. Ji bo wê xuya ye xwe li cihna veşartine. Ji ber ku hîn têkiliya me bi wana re çênebûye. Me bi cîhazê çiqasî bang kir deng nedan.”
- “Hema tiştêk bi wana nehatibe baş e!”
- “Bawer nakim; ew şarezayê van deran in .”
- “Hîn nebûye dereng divê em biçin. De bi xatirê te, heval!”
- “Bi xatirê te.”
- “Oxir be ji we re, silavan jibîr nekin.”
- “Na na!”

Her du gerîlan berf dîsa bi serê pêlavên xwe kolan û derbas kirin. Serevraz meşiyar û ji ber çavan winda bûn. Dengê lingê wana jî qet nedihat. Kefî û cawbaranka xwe kişand ser serê xwe ku binive. Lê xewa wî nedihat. Bêdengiya ketibû ser Gelî derengiya şevê, nêzîkî berbangê xera bû. Ji rêka diçû Dola Şumûniyê dîsa kevir digindirîn. Ji xwe re got:

- “Wa ye, heval vedigerin, xuya ye karê xwe dereng qedandine.”

Hedî hêdî çavên wî çûn ser hev û xew lê şêrîn bû. Dema dengê lingên gerîlan êdî hew digihiştin guhê wî, ji mêj ve koçî cîhana xewn û xeyalan bibû.

\*\*\*

DEH

Sibehê dema hişyar bû, rojê ji mêj ve tîrejên xwe ji nawserê berdabû berpalkan. Ji birçiyar re nava wî dikizirî. Destê xwe avêt kevçî û berf kola, heta ku ghişt a nerm. Kevçiyê xwe nêvî kir û bir ser zimanê xwe. Piç û piç di devê xwe de hiland û mijt. Aveke hênik di qirika wî re herikî jêrê û heta ghişt binê zikê wî, bi hênikahiyê hisiya. Tiştê hat bîra wî û keniya. Hişê wî çû ser zaroktiya wî.

Di hewşa wan de bîrek hebû. Di rojên germahiya havînê de herdem ava hênik jê vedixwarin. Dema dewl berdida binê bîrê, şerît hêdî bi hêdî sist dikir û guhê xwe dida ser bê kengî bigihê avê. Dema dewl li avê diket carna ji çerpiniya avê, carna ji hejandina ben di cih de pê dihisiya. Herikîna ava sar a binê zikê wî jî wekî çûna dewlê ya binê bîrê, hatibû ber dilê wî û bi vê şibandinê dikeniya. Ji xwe re got:

- "Gelo niha heval çî dixwin?"

Hevalên hatibûn cem diyar kiribûn ku li Gelî Tirşkê, li nuqta Serê Daran bi cih bûne. Ew nuqte baş nas dikir. Du şikeft û berizde lê hebûn. Li jora nuqtê kaniyeke avsar ji bin tehtê derdiket. Nuqte bi xwe di bin Siya darên gozan de hatibû çêkirin. Her dareke gozê destê sê zilaman li dora qurmê wê nedihat hevûdu. Ji xwe di nava gelî re robarek ji ava berfê û ji ava kaniyan diherikî, diçû ser ava Hozê û Mêhrê. Hozê û Mêhrê du gundên filehan bûn û li jêra Gelî Tirşkê cih digirtin. Dêrên her du gundan jî wekî kevnareyên dîrokî

hîn di hundirê tehta hatiye kolandin de li ser xwe bûn. Lê her du gund ev çend sal bûn, bi darê zorê hatibûn koçberkirin û gund niha bibûn xirbe.

Gelî Tirşkê, ji navsera Kêlê, ji Kavlê Kulekan destpê dikir û heta ava Mêhrê dadiket. Ji bo wê heta cihekî, têr dar bû, lê ji wî cihî û şûn de, êdî zozanan destpê dikirin. Li zozanên wê heliz, rêwaz, guhbizink, sîrik, qorat û soryaz şîn dihatin. Heta ji serê gelî mirov dadiket binê gelî dikarîbû şînatîya çar demsalên cûda cûda bibîne. Pir geliyekî bi xêr û bêr bû, lê di vê werza biharê de ji giya bêtir tiştêkî bixwin tinebû. Giya baş bû, lê ji bo xwarina giya rûn û xwê pêwîst bû. Ger rûn û xwê tinebaya, tama giya jî nedîma. Lê dîsa jî hebûna giya, ji tinebûna wê baştir bû. Rûn û xwê tineba jî, giya birçîbûna mirov dikuşt û mirov li ser lingan dihişt.

Sê salên li Bestan, bi vî awahî borandibûn. Gelek caran giya kom dikirin, dikelandin, digivaştin û wiha bê nan, bê xwê û bê rûn dixwarin. Ji ber ku tama xwe tinebû, dil jê dixeliyan lê dîsa jî, ji bo mayîna li ser lingan baş bû û ji ber vê yeke jî qiymet didanê, dema nuqtayên xwe hildibijartin, ji cihên têr-guhreşk an ji cihên têr-qîvark û sîrik hildibijartin ku bikaribin bijîn.

Her dan du-sê hevalên bikaribin di xwe re bibînin, wê kefiyên xwe bigirtana destê xwe û li derdora nuqtê bigeriyana. Guhreşk û sîrik ewqasî gelek bû ku, zêde hewce nedikir ji nuqtê dûrkevin. Ji bin dareke berûyê, yekî dikarîbû niv kefi guhreşk, bi rehetî kom bikraya. Lê sîrik ne di bin daran de, li cihên bê kevir ên wekî mêrg û çîmenan şîn dihat. Carcaran li erdeke seranser sîrik rast dihatin. Yek kêmasiya sîrikê tenê hebû ku ew jî zû pîr dibû. Dema pîr dibû, nedihat xwarin. Ji bo wê bêtir li cihên têr-av digeriyana; ji ber ku sîrika wan deran ji ya cihên kêr-av derengtir pîr dibû.

Ji bo komkirina qîvarkan divîbû ji nuqtê kêk kêk nîv saet, saetekê dûr biketana. Ji bo wê herkesî meşeke wiha dirêj nedida ber çavên xwe. Enerjiya di wê saeta gerê de xerç bike, di nuqtê de têra wî dikir ku sê-çar saetan jîyan bike. Lê di encam de divîbû yek ji wana çeka xwe û kefiya xwe bigre û berê xwe bide serevrazê nuqtê. Êdî çi qismet be; ji milekî ve nêçîr, ji milekî ve komkirin. Lê ji aliyê nêçîrê ve zêde ne bextvekirî bûn. Berazên li Bestan dijiyan wiha bi hiş û fêhm bibûn ku dema pezê gerîlan hebaya, di nîvê nuqtê re derbas dibûn, lê dema gerîlan ji birçiyên re dimirin, ew jî êdî diyar nedibûn. Li her derê şopên wan, wargehên wan dihatin dîtin, lê ji bo derman be jî, yek beraz nedihat dîtin. Ji bo wê gerîlan car caran henek li hevûdu dikirin û digotin:

- “Gakovî jî dizanin ku em birçî ne, ji bo wê nayên van deran.”

Ji berazan re digotin; ‘Gakovî’ ku kesên ji xwarina berazan aciz hebin pê nizanibin dê gerîla goştê berazan dixwin. Carcaran mîlîsên oldar an şervanên nû hatine li rastî goştê beraz dihatin û wê demê dipirsîn bê goştê kîjan ajalî ye? Ji bo nebe sedema bertekiyê, digotin; ‘Goştê Gakovî ye!’ Lê di rastiye de li çiyayên Kurdistanê pezê kovî hebû, bes gayê kovî tinebû. Şervanên nû, ji xwe, ev yek nizanîbûn û pê bawer dikirin. Yê mîlîs jî xwe kerr dikirin ku ne ew dilê hevalan bihêlin, ne jî heval bikevin tengezariyê...

Dema beraz nedihat dîtin, sivorî û kîso gelek bûn. Çar pencek ji wana –ku bi hinek giya re dihatin kelandin- xwarina danekî ya mangekê jê derdiket. Wê danê goşt û giya xwaribana xwe mîr dihesibandin. Bi rastî xwarina wê ne xerab bû, heta gelek caran pir xweş bû; lê çêkirina wê pir zahmet bû. Jêkirina kîsoyan û paqijkirina goştên wana tenê zahmetiyeke sê-çar saetan dixwest. Çêkirina goştê sivorîyê rehet bû, lê ew jî kesî pê têr nedixwar. Ji bo girtina

sivoriyan tecrube ji Gundikremoyîyan girtibûn. Gundikremoyî di girtina sivoriyan de wiha pispors bûn ku di dema li gundê xwe bûn de; yekî rojê ne kêmî sîh-çel sivoriyan dikarîbû bigre. Ji bo vê, dara sivorî tê de tespît dikirin, kunên darê tev digirtin û bi bivir binya kuna sivoriyê dibirîn; destê xwe dirêjî kunê dikirin û sivorî derdixistin diavêtin tûrikê xwe. Ji xwe karê Gundikremoyîyan berhevkirina komirê û girtina sivoriyan bû. Li aliyê nizar ê Cûdî bi cih bibûn û bi vî karî dijiyan. Yê ji wana hatibûn nava gerîlan jî, dema çav li sivoriyekê diketin xwe nedigirtin û di cih de bi pey diketin.

Qet jibîr nake; carekê li Cûdî Yekîneyeke heval kom kiribû û perwerde dida wana. Di wê bêhnê de sê çar heval bi hev re rabibûn ser xwe û qîr dabûn. Tev şaş mabûn. Lê zû têgihîştibûn ku ew ên qîr dabûn çav li sivoriyê ketibûn û Gundikremoyî bûn. Ji xwe perwerde bi vê qîrdayînê sabote bibû. Pêwîst mabû navberê bide perwerdeyê. Di navberê de her yek bi aliyekî ve çûbûn. Lê yê Gundikremoyî dîtibûn ku sivorî ketibû kuna darê û hîn tê de bû. Çi bikin? Fêrbûna sed salan! Li dora darê çûbûn û hatibûn. Bivir tinebû ku qut bikin. Wan jî hinek pûş xistibûn kunê û pêxistibûn ku sivorî ji bêhna dûmanê derkeve. Di wê bêhnê de navber bi dawî bibû û ji pêwîstî vegeriyabûn cihê perwerdeyê. Lê bêhneke şûn re wî pûşî agirê xwe derbasî hundirê kunê kiribû û dest bi şewitandina darê kiribû. Dar wiha ji hundirê xwe dest bi şewatê kiribû ku bi carekê re pêt di devê kuna sivoriyê re avêtibû. Êdî nema dikarîbûn perwerdeyê bibînin. Her yek reviyabû ser kaniyê û metereyê av anîbû ku bi lez agir vemirînin. Lê agir xwe berdabû hundirê qurmê darê û avlêkirinê fêde nedikir. Dûman bi ser darê diket û bilind dibû. Dawî pêwîst man ku nuqta xwe biterikînin û xwe bidin cihekî din...

Ji bo vê ya baş dîsa nêçîra berazan bû lê beraz jî bi zêr peyde nedibûn.

Her sal ji destpêka biharê –dawiya meha Sibatê û destpêka meha Adarê- heta destpêka havînê –piştî meha Tîrmehê- halê wana ev hal bû! Li Bestan qût nedima. Qûtê payizî kişandine binê erdê, tenê heta Sibat an Adarê li ber xwe dida. Dema perwerdeya zivistanê xelas dibû, qûtê wana jî bi dawî dibû. Êdî refên gerîla ji hev cuda dibûn; herkesî dixwest ku biçin zozanan, lê pêwîst bû hinek jî li Bestan bimana û karê biryargehî bikrana.

Ên diçûn zozanan ber bi gund û bajaran ve vedibûn. Ji van gund û bajaran qût derdixistin û li ser piştî hêstiran bar dikirin, rêdikirin Bestan. Dîsa bi cerdewanan re diketin şer, pezê wana direvandin û berê pez jî didan Bestan. Lê heta çûna wan, bidestxistina qût û pez û rêkirina Bestan, kêmkê du meh derbas dibûn û ne kêmkê mehekê jî li hêviya hilandina berfa zozanan diman. Ji bo wê her sal hêzên gerîla yê li Bestan diman ji Adarê heta Tîrmehê divîbû jiyana xwe ji xwezayê bidest bixistana. Ger ji zivistanê hinek xwê û rûn ji wana re maba baş bû; lê ger nemaba halê wana ne ti hal bû...

Kevçiyê xwe di berfê de çikand û pala xwe da tehtê. Xwe bi xwe li hişê xwe şaş ma; evqas vegotina giya û goşt ji ku hatibû bîra wî? Bi rastî ev bîra mirov jî wekî çala bê binî bû; her tişt di hundirê wê de bû. Lê dema mirov bi xwe lê digeriya û dixwest tişteki bibîne, kerr û gêj biba jî nedidît, lê ku bala wî ne li ser ba jî, carcaran wekî kaya were dêran, hil dibû û komeke bîranîn bi ser rûyê avê diketin. Mirov xwediyê bîreke ecêb bû. Xwedê dizane di vê bîrê de çi hebûn û çi tinebûn.

Demekê dîsa di rojên zaroktiyê de pirtûkek xwendibû. Wekî niha dihat bîra wî. Di wê pirtûkê de qala jin, mêr û têkiliyên wan ên li gorî

rêzikên civakê û ne li gorî rêzikên civakê dikir û dianî tev bi neynikan ve girê dida. Digot ku; ‘Neynik şahidên bîranînên mirov in’. Ev rast bû û dinivîsî ku; ‘Di şeveke diyar de neynik, wê tiştên bi salan biriqîna xwe dane ser, tevan wekî perdeya sînemê nîşan bidin û pêşkêş bikin. Wê pîr ciwaniya xwe, ciwan zaroktiya xwe, zilam zavatiya xwe, jin bûkitiya xwe bikaribin di wê neynikê de bibînin’. Mirov bi bihîstina ve agahiyê pir kêfxweş dibûn û hemû baz didan neynikên tewra kevin ên şahidên zaroktî û ciwaniya xwe, kom dikirin. Li gorî agahiyê wê neynikan ji nivê şevê û şûn de dest bi diyarkirinê bikrana. Ji bo wê jin û mêr neynik datanîn hemberî xwe, diketin nava nivînan û lê temaşe dikirin. Lê di wê bêhnê de tiştek dihat bîra wana û dilê wana ji neynikan sar dibûn. Jin û mêr her yek ji aliyekî ve radibûn, radihiştin neynikekê û li bin guhê erdê dixistin parçe parçe dikirin. Bi wê jî têr nedibûn, bi pêlavan derdiketin ser û hûr hûr dikirin. Bi melkesê dimalaştin û diavêtin binê sergo. Ew kêfxweşî û coşa wana, dibû hêrs û xemgînî. Sedem çi bû ku mirovan nedixwestin li bîranînên xwe temaşe bikin? Her mirovek xwediyê bîranînên xweş bû, lê her bîranîna xweş gelo li gorî yekî/e din jî xweş bû?

Jinek ku di ciwaniya xwe de ji xortekî hez kiribû; dizî bi dizî li quncikeke malê dihatin cem hev û ramûsanek ji hev digirtin, ger ne bi wî xortê dilketiyê re, bi zilamekî dê û bavê wê ecibandiye re zewicî be, pir dixwest careke din li wê bîranîna xwe vegere, lê zilamê wê yê li kêlekê dirêj kirî jî, wê li wê bîranînê temaşe bikraya û belkî ev bûba sedema pevçûnekê, heta jihevûduveqetînekê. Ya zilamekî ku jina xwe bi pîreka cîranê xwe re xapandibe û jina wî ev xapandin di neynikê de dîtiba, gelo êdî zilam dihewand nava nivînan xwe?



Bi van bîraninan jin û zilam her du bi hev re rabibûn û neynikên xwe şikandibûn. Bi berbanga sibê re dema paqijkarên rêkan li nava kolanan belav bibûn, wê rojê heta êvarî karê wana bibû komkirina parçeyên neynikên hûrhûrkiî. Giştiya gelheya bajêr wê şevê neynikên xwe şikandibûn. Bîra mirov wiha bi serê mirov dikir.

Hinekî bîra xwe jî vekola; tê de çi hebûn û çi tinebûn! Gelo xêrên wî pir bûn an gunehên wî. Ger çûba ber pira selatê, wê heşekere bibaya. Lê Xwedê dizane mêzêna li wir ka çawa bû? Yê li ser mêzênê radiweste jî ka yekî çawa ye? Li dikanan bi çavên xwe dîtibû. Hinekan kehrebar (miqnetis) bi binê mêzêna xwe vekiribûn ku girantir bikişîne. Hinekan binê kîloyan kun kiribûn û parçe jê derxistibûn ku kîloyek ji kîloyeke rastî siviktir be. Divîbû ew kesê li ser mêzêna li pira selatê rawestiyaye ne mirov ba, ferîşte (milyaket) ba ya. Digotin ferîşte gunehan nakin, derew çi ye nizanin, xerabî qet nayê bîra wana...

Hizirî û ghişt wê qinyatê ku dibe ferîşte saf ango xeşîm bin. Wê çaxê jî dibe ku hinekên çavekirî wana bixapînin; gunehên xwe kêr, xêrên xwe zêde diyar bikin. Bi kurtahî li wê dinyê jî dîsa rehetî tinebû. Dîsa xapandin, newekhevî û borandina karê xwe wê hebaya. Wê çaxê hewce nedikir ku biçûba wê dinyê. Ji xwe belkî ew dinya tinebû jî. Mirov dema lawaz diket, neçar dima, ew dinya dihat bira wî; lê dema li ser xwe ba, qet nedihat bîra wî. Wê demê ew dinya encama lawazbûna mirov bû. Mirov her dema bêçare dibû, xwe li hêzekê digirt ku ji xwe re bike piştqewînî; ev li vê dinyê axe û beg, li wê dinyê jî xweda û ferîşte bûn.

Gelo wê ev roj çawa derbas bibaya? Çima vê sibehê hiş û ramana wî tev wiha tevlihev bû. Çima hemû bîranin û bîr û baweriyên wî rabibûn ser lingan û êrîşî ser mejiyê wî dikirin?

Xwest ku hişê xwe vala bike û yek tiştî tenê ji neyne bîra xwe. Serê xwe hejand û çavên xwe dan ser hev. Kêmekî perdeyeke gewr ket ser bîra wî, lê pişt re wekî kevirê li avê bikeve, pêl bi pêl belav û berfireh bû û bîranin li ser bîranînê serî hildan. Bi bîranînên xwe re ket giftûgoyê. Bîranînên wî hesap jê dipirsîn û ew bi ser bîranînên xwe de diçû, ew binpê dikirin. Digot:

- “Ne wekî te ye, tu ne rast diaxivî!”

Lê bîranînê jî digot:

- “Na wele yê nerast tu bi xwe yî. Te pehîna xwe li her tiştî xist û te xwe anî vî halî.”

- “De here tu jî, mirov bi tena xwe, ti caran nikare qedera xwe xêz bike. Qedera wî ji aliyê derdorê ve tê xêzkirin.”

- “Tu bi xwe jî dikarî xêz bikî.”

- “Na tu şaş î; ku mirov li nava baxçeyê gulan be, mirov gulan bêhn dike, lê na ger mirov li ser sergo be, mirov her rexê bêhn dike. Tu çima vê rastiye nabînî? Ka ez te deynim ser sergo û pişt re bêjim; ‘Te çima gul bêhn nekirine, ka ez bêvila te jê vekim!’”

- “Tu jî li ser sergo nese kin!”

- “Ma bi destê te ye! Tu girêdayî ye!”

- “Êh, ku ez çi bejim, tê her a xwe bi ser a min bixî; ji bo wê ez qet neaxivim baştir e.”

- “Ji bo min jî ne xem e. Ji xwe tiştê çûyî çûye; ez êdî bi pey nakevim. Lê niha tu min rehet berde û hişê min nebe ser tiştên bê fêde. Ka ez ji vir xelasbim, ez dizanim ezê çi bikim.”

- “Tu çi dizanî? Tê dîsa wekî xwe bikî!”

- “Ji xwe ezê wekî xwe bikim. Ger ez wekî yekî din bikim, wê çaxê ti wateya min namîne ku ez bêjim; ‘Ez mirov im û ez heme!’”

- “Xwe bicibîne!”

- “Ezê xwe bicibinim. Ma çima ezê ji xwe aciz bim? Mirovê ji xwe aciz be, çawa dikare ji hin kesên din razî be? Ma ne divê destpêkê mirov ji xwe razî bibe ku bikaribe ji derûdora xwe jî razî bibe.”

- “Rêxistin qebûl nake. Pêdiviya te bi rexnedayîneke xurt heye!”

- “Ew karê min e, ne yê te ye. Tu bes aqil bide min û min êdî newestine, bihêle ez kêmekê xew bikim.”

- “Tu bi vê ramanê qet nagihêjî derekê. Partî bi rexnekirina mirovê kurd li pêş ket! Ma qey te jibîr kir?”

- “Min jibîr nekiriye. Rexne ji bo destpêkê kes bi rastiya xwe bihise dibe ku xwediye pêwîstî û grîngiyekê be; lê yekî bi rastiya xwe hisiyaye û xwe ji hemû peywendiyên civakê qut kiriye, hatiye bi her fedekariyê têdikoşe; bi ser de mirov bêje; ‘Tu ne tiştêk î, tu bi kêrî karekî nayê!’, ew êdî ji bo wî kesî nabe rexne û rêbaza pêşketinê, dibe ya tinekirin û binpêkirinê!”

- “Ya! Tu wiha difikirî?”

- “Erê ez wiha difikirim.”

- “Ger tu mêr bî rabe vê gotinê di platformekê de bêje!”

- “Mesele ne mêrbûn e; mesele hebûna mejiyê wekî te bi qalib difikire ye! Ka dev ji min berde ez hinekî serê xwe rehet bikim. Bes min bi van tiştên dubarekar mijûl bike.”

- “...”

Careke din çavên xwe girtin û zor da xwe ku tiştêk neyê hişê wî. Lê carekê ba û bagerê hêza xwe dabû ser bîra wî. Wekî ewrên li ber ba diborîn, bîranînên wî jî dabûn pey hev û di ber çavên wî re diboriyan. Nedixwest ku yek bi yek li ser wana raweste û bi wana mijûl bibe, dema xwe biborîne. Ji bo wê lez bi lez diborandin. Zaroktî, ciwantî, rojên li welat... tev wekî şerîta sînemê ya lezkirî

derbas dibûn. Ewrên li ezmanê pêşberê wî jî hûr, girs, nîv tarî, kêmtarî, belave... li ser hev, tev bi hev re derbas dibûn.

- "Gelo evqas ewr bi ku ve diçûn?" Ji xwe pirsyar kir û bi xwe bersivand."

- "Niha hemû li navsera Girê Nizmo komî ser hev dibin. Dema navser bi tevahî hat girtin, êdî wê ezman dest bi xwevalakirinê bike. Xuya ye wê pîs bibare. Baş e ku cawbaranka min heye. Lê serma jî wê îmana min biçikîne!"

Dîsa çavên wî çûn ser hev. Bi kotekî ji hev vekirin. Pala xwe ji tehtë vekir û li ser kamaxa xwe rûnişt. Li saeta xwe nêrî; hîn dehê rojê bû. Li gorî ramana wî, hevalên wî tam di dema xwe de hatibûn. Lê mixabin bê amadekarî hatibûn. 'Qet nebe mirov kêmeke tûtin, qeteke nan bi xwe re tîne!'

- 'Ya ku li gel wan tinebe!?'

Anî bîra xwe ku roja ketin şer ji birçiyar re ketibûn şer. Piştî şer jî wê xwarin ji ku derê peyde bikrana? Femandarê çûbû gundê cerdewanan ku kêmeke qût bîne jî venegeriyabû. Komplojek bi serê wî nehatibe, ew jî baş bû. Zarokê wê herêmê bû, lê bextê cerdewanan tinebû; ji bo berjewendiya xwe, dikaribûn serê wî diyariyê dewletê bikin. Ma hindik kiribûn?

- "Bila ew jî xwe nexe nava destê wana. Bila hişyariya xwe bike. Têkilî cuda ye, ewlekarî û bawerîkirin cuda ne. Mirov karê xwe jî pêk b(i)îne, lê tedbirên xwe jî bistîne.'

Lez û beza ewran kêmekî sist bû, lê pêşya tîrêjên rojê girtin. Şînatîya ezmên cihê xwe da gewrbûneke tenik. Lê bêhneke din pêleke din a bayê kur hat û ew gewratî tev tar û mar kir, ewrên dane ber xwe yek bi yek di ser Kêlê re firandin û ber bi Kato û Girê Nizmo ve ajotin.

Girê Nizmo girê tewra bilind ê erdnîgariya Botanê bû. Serê wî tûjî bilind bû; lê li navsera wî golên avê hebûn û qazên kovî di nava vê avê de milevanî dikirin. Pirahiya salê mij û dûman ji navsera wê kêm nedibû. Ewrek di ku derê re derbas bûba, xwe li vê navserê digirt û li wir bêhna xwe vedida. Ji bo wê navsera Girê Nizmo herdem hênik û sar bû. Lê temaşekirina xweşikbûna gola wê, ew serma dida jibîrkirin.

- “Xuya ye îroj jî baran nabare. Wê êvarî heval bîn û emê biçin. Hîn nebûye sibeh divê em bigihên navserê. Pêwîst e, em li vî milî nemînin û biqulipin milê din ê Kêlê. Ji bo wê jî dibe ku heta sibehê em bimeşin. Ger ez niha xew nekim, êvarî wê xewa min bê û li hevalan bibim bargiranî. Divê ez razê, lê ev bîranîn nahêlin. Ez nizam, dema çavên min diçin ser hev hemû pêk re êrîşî ser hişê min dikin. Gelo ji çî ye? Tiştê heba, min xwe pê mijûl kiriba, belkî ew jibîr kiribana.

Destê xwe avêt bêrîka xwe. Radyoya xwe derxist. Gelo wê bikarîba çêbikraya? Ji bêrîka gumlekê xwe cerbadereke (tornawîdayek) biçûk derxist; herdem ev tornawîda bi xwe re digeland. Ji ber ku pêdiviya wî pê çêdibû; dem bi dem pê vîdayên berçavka xwe dişidandin. Radyo ji yê bi qapax bû û têlên wê qetiyayî bûn. Qasî dizanîbû ku di van bêderfetiyan de çênabe jî, lê dîsa jî ji hevûdu vekir. Her perçeyekî wê danî aliyekî. Têlên wê gihandin hev ku dengê jê derkeve. Lê bê fêde bû. Piştî westandineke xurt, êdî biryar da ku li hev bixe. Careke din yek bi yek parçeyên wê anîn cem hev û li hevûdu siwar kirin. Bi rastî mejiyê wî westiyabû û xeweke giran a ji dil dabû ser çavên wî. Ji milekî ve jî pir birçî bibû. Lê niha di xwe re nedidît ku xwarinê bixwe. Bi lez û bez parçeyên dawî yê

radroyê şidandin ser hev û xist bêrîka xwe. Xwe bi erdê re dirêj kir  
û serê xwe danî ser tehtë.

Çavên wî çawa çûn ser hev, xewê çawa ew dîl girt û çawa ji ser hişê  
xwe çû, nizanîbû.

\*\*\*

## YAZDEH

Dema hişyar bû tavê dabû nivê çavên wî û laşê wî tev di nava  
xwêhdanê de mabû. Cawbarank û kefî ji ser laşê wî çûbû û vingîniya  
mêşên kesk li ser birîna wî bû. Di cih de dilê wî qurmiçî û kela girî  
ket qirika wî. Gelo wê ev Gelî biba gora wî!

Rahişt lingê xwe yê birîndar û kişand nêzî xwe, bi hêdî danî erdê.  
Dest bi vekirina şûtika girêdayî ser birînê kir. Fitlonek bi fitlonek  
vekir. Her ku nêzîkî birînê dibû şûtik bêtir şil bû û bêhna nême  
difûriya. Dema gihişt fitloneka dawî, çavên wî li nivê serê wî bel  
vebûn. Ew çibûn li ber çavên wî ketibûn!? Serê xwe daqûl kir û ji  
nêz ve lê nêrî. Belê, şaş nedîtibû; rêzek hêkên mêşa kesk danîne dît.  
Bû qurpe qurpa nava dilê wî. Bi lez şûtik tevahî vekir û li birînê nêrî.  
Nêmeke zer girtîbû ser tevahiya birînê. Çiqasî bi baldarî lê nêrî jî, ti  
tevger an livandin nedît. Kêmekî dilê wî rehet bû.

Ji milê şûtika paqij qetek jêkir û ji wê qetê çend qetên din ên biçûk  
jêvekirin. Qetê biçûk tew bi tew li hev pêça û pê nêma daye der  
ziwa kir. Heta ku gihişt goştê sor ev kar domand. Dema qîma wî bi  
paqijbûna birînê hat, qetêke fireh a şûtika paqij danî ser birînê.  
Rahişt şûtika xwe û buhist bi buhist di ber çav re derbas kir. Li du  
cihên din, li hêkên mêşa kesk rast hat. Her çar komên hêkan ji şûtikê  
qetand û danî kêleka xwe. Pişt re şûtik li ber tavê raxist ku cihên bi  
nême ziwa bibin.

Destê xwe avêt bêrîka xwe û hesteyê xwe derxist. Qetên hêk li ser bûn, dan ber agir û şewitandin. Bêhna naylonê û kizirînê ket bêvila wî. Lê hîn dilê wî rehet nebibû û dizanîbû ku mêş wî rehet bernadin. Êdî divîbû pir hişyar be û bi roj xew neke ku mêş careke din derfeta hêkdanîna ser birînê nebînin. Vê carê ketibû xewa xafletê, lê zû pê hisiyabû. Ger careke din wiha bikraya, wê vê carê xerabtir bibaya! Baş bû ku li hêkan rast hatibû. Ya ku hêk nedîtibana û tev bibana kurm û girtibana ser birînê, wê halê wî çawa bibaya? Dizanîbû ku kurm nême dixwin, lê piştî nême êdî wê goştê laşê wî xwaribana! Her ku kurmek di hundirê goşt de bilebitiya, wekî morîartêşek di hundirê mejiyê wî de bilebite, wê wiha mejiyê wî bileqiya. Ji milekî ve jana hestî ya dema di goşt re radibû, ji milekî ve şewat û kizirîna nava wî ya piştî xwarina berfê ne bes bû ku lebitîna kurman jî bi ser ve biba!

Şûtika li ber tavê ziwa bûye, careke din di ber çavan re buhist bi buhist derbas kir û pişt re li ser birîne pêça. Dawî kefiya xwe jî bi pehnikî li ser giştiya şûtikê pêça û rahişt lingê xwe, dîsa dirêj kir. Cawbarank avêt ser û pala xwe da tehtê. Lê bi rastî jî dilê wî ne rehet bû; wekî tişteke di hundirê birîna wî de dilebitî!

Dema baş bala xwe dida ser birînê, bi lebitîne nedihisiya û digot:  
- “Hingî tirsî kurman li ser min çêbûye, ku mûyek jî dilebite, ez dibejim qey ew in. Ma ne min niha birîn paqij kir û tişteke nedît. Hêk tev jî şewitîn. Êdî ev çî tirs û xov e?!”

Dîsa bala xwe ji ser birînê vedikişand. Demek derbas dibû, hişê wî diçû ser cihên din. Rêzexeyal di ber çavên wî re derbas dibûn, lê tam di wê bêhnê re wekî xurek bi birîna wî bikeve, bi lebitîne dihişiya. Di cih de vediciniqî û guhê xwe dida ser birînê. Lê çiqasî dima, careke din bi lebitîne nedihisiya.

Wê rojê heta êvarî deh caran bi lebitîne hisiya, rabû ser xwe, guh da ser birîne û her deh caran jî tişteke nebihîst û paş de pal da. Heta lê bû êvar, dilê wî deh caran hat ber devê wî û deh caran paş de çû. Roja wî hemû bi vê xov û tirsê derbas bû. Ne tişteke ji lebitîna kurman, ne ji xwe û ne ji roja borî têgihîşt. Roj lê bibû jahr. Baş bû ku bibû êvar û çend kêmsaetên din wê heval di hawara wî de hatibana. Êdî wê ev biba roja wî ya dawî ya li binê keviya berfê!

Destpêkê sî ket ser tevahiya Gelî û siyê rengê xwe gewr kir û ber bi tarîbûnê ve çû. Li ezmanan yek du stêrk diyar bûn. Gire gira jeneratora girê dijmin li ser e, da ser Gelî. Li saeta xwe nêrî; heşt û çarîkek bû. Ji xwe re got:

- "Namîne saetekê wê dengê lingê hevalan were. Niha ji nîvro ve ji Gelî Tirşkê bi jorê ketine. Li Dola Şumûniyê kifşa xwe kirine û bi tarîtiya êvarî re xwe berdane vî milî. Dema bigihên pêşberî min wê dengê lingên wana were."

Saetek derbas bû, du saet, sê saet, çar saet... Heta diwazdehê şevê her çavê wî li reşahiya berpâlên Kêlê, guhê wî li dengê gêrbûna keviran wiha dil bi kul û waswas ma. Her bêhnekê li saeta xwe dinêrî û li ser nehatina wan pîne li ser pîne dixist. Lê dema saet diwazdehê şevê derbas kir êdî ji hatina hevalên xwe, hêviya xwe qut kir. Ji xwe re got:

- "Ev ne tişteki ji rêzê ye. Kî dizane çi qewimiye ku nehatin. Helbet tengezariyek derketiye ku nehatine. Ger sibe jî neyên, wê demê divê ez destê xwe ji wana bişom û li çareya serê xwe binêrim."

Çavên wî li rê qerimîbûn. Hezar tişt pêk re diket dilê wî û dihat hişê wî. Gelo li wî milî jî operasyon derketibû? Gelo hin kes reviyabûn, an tişteke xerabtir bi serê wana hatibû?



Qet tiştêk jê nizanîbû. Hêviya wî di şeveke din de bû. Balkêş bû ku dengê lingê heywanekê jî nehatibû. Vê şevê yek kevir tenê jî ji cihekî negindirîbû.

Di nava van fikaran de xwe dirêj kir û çavên wî çûn ser hev. Di xewna xwe de diketin gelî û dijmin ji ser Girê Rîjdê ew didan ber gulebarînan. Çiqasî jî gotibû; 'Em nekevin gelî!', lê fermandarê biryargehê bi ya wî nekiribû:

- "Yaw em doh ji gelî derketin, em careke din vegerin wir nebaşê, wê tam planê dijmin pêk were."

- "Wekî din cihê em biçinê nîne. Bila destpêkê pez û şivan biçin ku hîn tam dinya nebûye ronî, ji ber çavan winda bibin."

Kê çî got, fermandar bi ya xwe kir û ji ser gotina xwe daneket. Ev zêdeyê du hefteyan li Gelî Tirşkê bi cih bibûn û nû ev rojek bû, jê derketibûn. Dema li Gelî Tirşkê bûn, dijmin bi wana hisiyabû û planê xwe yê operasyonê li ser Gelî çekiribû. Yê wê wî kevn û herêman dinasîn ji ber vê yekê nedixwestin vegerin Gelî Tirşkê û digotin ku vegerin Gelî, wê planê dijmin bi serkeve. Lê fermandarê biryargehê ji ber ku xwedî kêmtêcrube bû, Gelî ji bo xwe saxlemtir didît û qet bîr nedibir, dijmin ew li vir kifş kirine û bi wê sedemê tê ser wana. Ji bo wê berê giştîya hêza biryargehê da gelî û bi nezanî be jî bû sedem ku dijmin çawa plan kiriye, hêz wiha bi cih bibe. Ger bi ya hevalên xwe kiriba û hêza xwe ber bi Hêzil ve rêkiriba, dibe ku qet şer jî derneketiba û planê dijmin vala derbiketa. Lê mixabin niha bi hundirê gelî ve direviyan û dijmin gule li pey wana direşandin.

Serê pez ghiştîbû nêzî nuqta daran ku li wir jî teqîna guleyan hat. Pez û şivan li pêşya hêzê diçûn û bisteh dimeşîyan. Digotin qey pêşya wana vekiriye. Lê hêzên dijmin di navserê re jî hatibûn û ji Şanstêrê heta Kavlê Kulekan û Kavlê Memo her der girtibûn. Milekî

hêza dijmin xwe bi ser Qaplanê ve berdida û mileke din xwe berdida ser zinarên li jora Dêra Hozê.

Dema hêzên gerîla ber bi gelî ve reviyar, hêzên dijmin ji Girê Rijdê xwe berdan ser Ava Mêhrê. -Ava Mêhrê ji serkaniya çemê Hêzil, ji rasteya binya çiyayê Kato dihat, li jêra Gelî Tirşkê bi ava ji gelî tê re dibû yek û ber bi Avyan ve diherikî- Av derbas kirin û di gelî re, berav berav dan ser şopa gerîlan.

Baş bû ku qasî taximekê hêzeke bi tecrube ya gerîla, li biryargehê hebû û fermandarê wê ji ber erdnîgariya Gelî dinasî, berê xwe dabû Qaplanê. Dema ghiştibû tehtên di ser gundê Hozê re, dijmin jî ji navserê fikir xwe berde ser wan tehtan. Ger dijmin daketiba ser wan tehtan, êdî gerîlayên di Gelî de, ji her çar milan ve dihatin dorpêçkirin. Lê taximê gerîla berya leşkeran ghiştin ser wan tehtan û dijmin li Qaplanê dan rawestandin. Bi vî awahî milekî gerîlan ket saxlemiyê, lê ji her sê milên din ve gule dibarandin ser.

Dît ku bi rastî jî di tengezariyeke mezin de ne. Hin dokumanên çapemeniyê û daktîloya li cem û çenteyê xwe yê piştê, binê kursekê kola û veşart. Banta li ser bombeya xwe pêçaye vekir û ji bo teqandinê amade kir. Ji xwe re digot:

- “Êdî îroj mirin ji her rojê nêzîktir e.”

Cihekî pê ve biçûna jî tinebû. Çend gerîlayên têgihîştî, ji ber xwe ve çekên xwe hilgirtibûn û bi zinarên kêleka Gelî ketibûn. Lê nikarîbûn serê xwe rakin, ji ber ku dijmin xwe berdabû ser tehtên di ser serê wan re; ew di binê dijmin de mabûn.

Şerê di navbera leşkerên xwe ji jor de berdane Gelî û şivanan de, qut bû. Gerîlan xwestin ku têbigihêjin ka li wir çi diqewime. Du kes ji bo saloxgirtinê rêkirin; lê ti bersiv ji wana nehat.

Leşker û cerdewan ên di devê Gelî re li pey şopa wana dihatin, esas xetariya mezin ji wana wê çêbibaya! Divîbû ew hatibana rawestandin ango wê yek ji wana jî sax nemaba. Di hundirê Gelî de, di navbera du hêzên dijmin de mabûn. Hêza li şivanan rast hatibû xuya ye xwe zêdetir bernedabûn jêrê. Ger kêmeke din bihata jêrê, wê biketa kemîna gerîlan. Lê hêza ji jêrê ve dihat bisteh pêş ve dimeşiya.

- “Ev sedbav dixwazin weke nanik me di nava xwe de biperçiqînin. Bila heval werin, em li nivê Gelî kemînê deynin ku bizanîbin dew birayê mast e!” got gerîlayekî kevin. Ev demek e ji ser kar hatibû girtin û ji bo perwerdê li biryargehê dima. Cihê dixwest lê kemînê deynin, xala dawî bû. Yan wê li wir dijmin rawestin bidana; yan jî dijmin wekî gurê bikeve nava pez, wê yek bi yek pelî laşên wana bikraya. Tehta di nivê gelî de, li ser rêkê bilind bûye, ji xwe re kirin sîper û devê tîfingên xwe dan ser, tiliyên xwe birin ser lingên wan û bêhna xwe girtin.

Zû, ne dereng ji zîvironeka li pêşiya wana, du cerdewan bi hev re diyar bûn. Piştî du-sê gav avêtin şûn re leşkerek jî li pey wana ji zîvironekê derket...

Di navbera cerdewanan û tehta gerîlan li piştê bûn de, pênc-şeş gav man ku gerîlan bi hev re lingên çekên xwe kişandin. Her du cerdewan bi ser hev de ketin. Leşker ên zîvironek derbas kirine, xwe avêtin erdê û gindirandin kêleka rê. Cerdewanan jî xwe xijikandin ber qurmê darekê. Lê nale nalek ji yekî bilind dibû û bang li yê pey xwe dikir:

- “Gelmeyîn pusu var, gelmeyîn pusu var.”

Birîna cerdewanê din diyar e siviktir bû. Dest avêt lingê hevalê xwe û xwe kişkişandin binya rêkê. Êdî guleyên gerîlan ji wana nedigirtin.

Li binya rêkê ava gelî derbas dibû. Xwe di kêleka avê re gihandin zîvironekê û êdî pêş de nemeşyan. Bi vî awahî êdî du milên gerîlan saxlem dibû. Lê ji jora Gelî saloxeke ne xweş hatibû. Pez tev ketibû destê dijmin û ji şivanan jî ti xeber tinebû. Yan şehîd bibûn, an jî bi saxî ketibûn destê dijmin. Çend gerîlan di tehtên jorê re xwestibûn xwe bigihînin cihê şivanan lê nikarîbûn; dibûn armanca guleyên leşkeran û pêwîst diman ku paş de vegerin. Ji hevalê kêleka xwe re got:

- “Ka em di jê rê re biçin. Em gelî bi gelî biçin; pêşiya xwe se bikin û bimeşin. Dibe ku hevalên birîndar hebin, alîkarî ji wan re lazim be.” Hevalê wî ev pêşniyar di cih de dît. Rahîşt çeka xwe û ji ser tehtê daket. Her du heval xwe berdan ser rêkê ku berê xwe bidin jora Gelî û bimeşin. Lê dîtî ku komek heval ji dolika di kêleka wan re dîrej dibe, tîn. Meraq kirin û li hêviya wana rawestiyên. Piştî bêhneke kin, koma dihat gihişt wana û ji ber xwe ve salox dan:

- “Dijmin vedikişe, xeberê bidin hevalan bila dakevin Gelî ku em bizanibin kî sax e, kî şehîd e!”

Bi carekê re veciniqî. Çavên xwe vekirin. Laşê wî tev di nava xwêhdanê de mabû û lingê wî tevîzî bû, stûyê wî qerimî bû. Li ezmên nêrî; çik sayî bû. Yek ewrên bi roj hebûn tenê jî diyar nedikir. Ji xwe re got:

- “Gelo Stêrk ji ber xwe ve îşev zêde dibiriqîn, an li ber min wiha diyar dibe?”

Li kûrahiya ezmên nêrî. Stêrkên berê diyar nedikirin jî îşev xwe didan diyarkirin. Wekî qet valahî li ezmên nemîne, wiha têrstêrk bibû. Te çî cureyê sitêrkê bixwesta, dikarîbû bidîta. Di wê bêhnê de, sitêrkek ji raserî serê wî ber bi Çiyayê Cûdî ve herikî, pêtên agir li pey xwe rijandin û daket xwarê, winda bû. Di ber xwe de got:

- “Xwedê dizane ev sitêrka kê bû ku ji vê dinyê koç bû?”

Ji dayika xwe wiha fêr bibû ku her mirovek li ezmên xwediyê stêrkekê ye û dema stêrka wî dikeve, ew jî jiyana xwe ji dest dide. Dema zarok bû, bawerî bi vê yekê kiribû û her şev dema serê xwe datanî ser balgîfê û çavên wî li ezmanê Serekaniyê dikêt, yek bi yek li stêrkan dinêrî ku stêrka xwe bibîne. Lê nizanîbû stêrka wî yeke çawa ye! Li gorî xwe, ya tewrî ciwan dieciband. Lê carcaran didît ku stêrkên ciwan -ji yên zêde biriqandî re digot ên ciwan- jî diherikîn û diçûn! Wê demê dilê wî dihat givaştin, dişkest û tije kul û keder dibû. Di cih de çavên xwe digirtin û êdî nedixwest li stêrkan binêre. Lê şeveke din dîsa li nava stêrkan çav digerland ku stêrka xwe bibîne û li stêrkên dişemitîn temaşe dikir.

Dema mezin bû, çû dibistanê û sal derbas bûn; têgihişt ku tiştê dayika wî di derbarê stêrka mirov de gotiye, tev çîrok in û ji rastiye dûr in. Lê ji ber ku çîrok pir li xweşiya wî çûbû, tevî êdî bawer nedikir dîsa jî wiha dihesiband, her stêrkek nûnertiya jiyana mirovekî/ê dike û di dilê xwe de dixwest wiha be û çîroka dayika wî gotiye rast be. Ji xwe re got:

- “Nêzîk e ku stêrka min jî êdî biherike! Gelo kîjan a min e? Divê ez vê carê binasim. Qorziya kîjanê şikestî be, ew ya min e!”

Bi gotina xwe kenîya û awirên xwe li nava stêrkan gerandin. Lê ewqase pir stêrk û ewqase cûreyên wan hebûn ku ji çavwestandinê bêtir tiştêk bi dest nexist. Ji xwe xwêhdana wî jî lê sar bibû. Êdî bayê sibehê dest bi hatinê kiribû. Cawbaranka xwe kişand ser leşê xwe. Kêlekên wê xistin bin laşê xwe ku ba di ber re neyê. Serê xwe danî ser tehtê û çavên xwe girtin.

\*\*\*

## DÎWAZDEH

Sibehê bi lebitîneke di hundirê birîna xwe de, ji xewê veciniqî. Pala xwe ji tehtê vekir û li ser kamaxa xwe rûnişt. Guh da ser lingê xwe yê birîndar û bêhna xwe girt. Bêhnek, du bêhn, sê bêhn derbas bûn. Belê vê carê ne şaş bû. Tiştêk di hundirê birîna wî de dilebitî. Wekî mûyek di ser goşt re were kişandin, wiha lebitînek bi gincirî sivik bû lê ev dihat wateya ketina kurman a hundirê birînê. Xafleta saetekê, rê ji vê re vekiribû. Çiqasî li ber xwe dabû ku bê hemdê xwe di xew re neçe, lê çûbû û mêşa kesk jî ev derfet û firsend di cih de nirxandibû. Doh ewqase hêk ji ser birînê paqij kiribûn, lê diyar e kêmek jî ji ber çavên wî winda bibûn. Êdî niha dikarîbû çi bike? Derman jî tinebû ku berde ser û tevan bikuje!

Kurm dîsa lebitîn. Hesteke bi gincir dirêjî nava wî bû û aciziyêke tezînokî da ser laşê wî. Ji xwe re got:

- “Ev hîn wiha biçûk in vê aciziyê didin, ger sibe, duzbe mezin bibin wê mejî li min bileqînin. De were li ber xwe bide! Halê me ne bêsî me ye, êdî êşa ji kurman bê bikişîne!”

Cawbarank ji ser laşê xwe avêt. Kefî danî aliyekî û dest bi vekirina şûtika li ser birînê pêçayî kir. Yek bi yek tewên wê vekirin û danî kêleka xwe. Daqûlî ser birîna xwe bû û temaşeyê nava nêmê kir.

Birîna wî qasî kefa destekî pehn bû û di nîvê wê de kuneke heta gozeka linge wî dirêjî xwarê dibû, hatibû vekirin. Li kêleka vê kunê, tiştêk li ber çavê wî lebitî. Serê xwe nêzîktir kir û bêtir bala xwe da ser. Ne şaş bû. Di nava zerahiya nêmê de tiştêkî spî diyar dikir. Ew ne goştê laşê wî bû. Ger goştê laşê wî ba, wê sor ba ya. Ji bêrîka xwe mûçinga xwe derxist û dirêjî spîhatiyê kir. Spîhatî hat ber devê mûçingê. Rakir anî ber çavê xwe û ji nêz ve lê nêrî. Pişt re danî ser kefa destê xwe û lê temaşe kir.

Kurmê ji nava xwînê veqetiyayî wekî li cihê xwe bigere, ket tevgerê û bi milekî ve meşiya. Ji ber ku hîn yek-rojî bû zêde ne mezin bû, lê dîsa jî di meşa xwe de sivik bû. Dema gihişt kêleka kefa destê wî, dîsa bi mûçingê rahiştyê û li ser tehta li kêleka xwe perçiqand. Ji xwe re got:

- “Divê ez yek bi yek tevan paqij bikim ango wê îmana min bileqînin!”

Qeteke biçûk ji şûtikê vekir ku pê nêma kombûyî paqij bike. Bi paqijkirina nême re goştê sor jî derket holê û kuna birînê bêtir diyar bû. Kurmên nême ji ser wana rabûye, wekî pê hisiyabin, xwe bi paş ve dikişandin û ber bi kêrahiya kuna birînê ve dimeşyan. Mûçing avetyê û bi kotekî yek ji wana girt û danî ser tehtê. Lê dît ku du-sê libên din, di kêrahiya birînê de xwe veşartin. Awirên xwe çiqasî li wana gerand, ew nedîtin.

Êdî têgihişt ku tenê bi çêbûna nême re derdikevin ser birînê. Ji bo wê tiştê ji destê wî bihata, nemabû. Careke din şûtik li ser birînê pêça û li hêviya nîvro ma. Lê her bêhnekê kurman cihê xwe diguhertin û tezînokeke bi gincirî rêdikirin nava dilê wî û digihişt heta mejiyê wî. Êdî baş ji xwe bawer bû ku nikarîbû bi kurman re – bi hev re- jiyan bike. Her ku dilebitîn, wekî nava wî û mejiyê wî were xurandin, wiha aciziyek didît û tirs û xov tije nava wî dibû. Lê bi biryar bû ku serî ji wana re daneyne û li ber xwe bide; li hemberî wana têbikoşe. Di ber xwe de got:

- “Bila tav bigihê vê derê, ezê ji heqê we werim der!”

Kefî û cawbarank girt ser laşê xwe. Rahişt kevçiyê xwe û kêmek berf kola. Dema gihişt berfa nerm, kevçiyê xwe dagirt û bir devê xwe. Êdî tam fêrî xwarina berfê bibû. Her kevçiyê berf dimijit, wekî kevçiyê xwarin çûye zikê wî, wiha pê têr dibû. Bi rastî jî bêhneke

din, êdî dilê wî jê têr bû. Kevçî di berfê de çikand û pala xwe da tehtê, awirên xwe direjî ezmên kir. Îroj ezman sayî bû. Libo libo ewrên biçûk hebûn, lê wekî doh û pêr nedibeziyan. Di cihê xwe de rawestiyabûn û nazdar nazdar rê digirtin.

Dengê helîkopterekê li ber guhê wî ket. Deng pir ji dûr ve dihat. Guhê xwe da ser, lê têngihişt ku ji milê Şirnex tê, yan ji milê Qlaban tê. Tenê wiha hizirî ku nêzî girê dijmin li ser e, dibe. Bêhneke din dengê wê qut bû û qasî kişandina cixareyekê şûn re, dîsa pite pita baskên wê hat. Vê carê wiha hizirî ku deng bi ber Sêgirkê ve diçe. Êdî heta nîvro ti deng nehat guhê wî. Tenê carcaran yek-du bilbil dihatin ser zinarê di ser sere wî re û bi awazeke zelal, dengê xwe vala dikirin û diçûn.

Piştî nîvro dema tav hat ser laşê wî, careke din birîna xwe vekir. Şûtika ji nêmê şil bibû, li ber tavê raxist. Ji cihê paqij çend qetên biçûk jêkirin ku pê birînê paqij bike. Birîn dîsa ji nêmê zer bibû û di nava zerahiyê de êdî rehetir spîhatiya kurman diyar dikir. Bi mûçingê tam sê kurm girtin û ji nava nêmê kişandin, danîn ser tehtê. Kurmên diketin ser tehtê şopeke şil li pey xwe dihiştin û her yek bi milekî ve diçûn, li şilahiya xwîn û nêmê digeriyan...

Kurmeke din li ber çavê wî ketibû, lê wekî kurm têngihiştibû wê were girtin, xwe paş de kişandibû; serê wî ketibû bin nêmê û nediyar bibû. Rahişt qeteke şûtik û nêm paqij kir. Careke din goştê sor derket ber çav. Kuna birînê dîsa diyar bû. Lê kurmê xwe paş de kişandî, ne diyar bû. Gelo bi nêmê re çûbû, yan xwe berdabû kûrahiyê? Bêhnekê li hêviya lebitîn an derketina kurm rawestiya. Lê ti liv ji kurm çênebû. Rahişt qeteke din a şûtikê û birîn, kuna birînê û derdora wê tev baştirîn ziwa kir. Qeteke şûtika pehn girt ser birînê û şûtik li ser pêça.



Her du kunên di ser birînê re jî bi qetêke şûtîkê paqij kirin, lê wana zêde nêem negirtibûn. Ji xwe, ji ber birîna mezin ev ên biçûk gelek caran jibîr dikirin û dema parçeyên rokêta kobrayê lê ketibû jî, bi van her du birînên biçûk nehisiyabû. Roja din, dema li birîna xwe nêrîbû, dîtibû ku di ser birînê re va ye du kunên din hene. Dawî, şûtîk li ser wê derê jî peça û kefi li ser giştiya birînê pehn kir û girê da. Rahîşt lingê xwe û di ber ê saxlem re dirêj kir. Kêmekî xwe paş de kişand û kefiya xwe girt ser her du lingên xwe. Awirên wî li tehta li kêleka wî ketin. Kurmên danîbûn ser tehtê, hatibûn kêleka tehtê û rawestiyabûn. Bi serê mûçingê ew dehfandin. Lê ti livandin ji wana çênebû. Bê xwîn û bêmêmayînê jiyana wan bi dawî kiribû! Xwe westiyayî dibihîst. Laşê wî betilîbû û sist bibû. Xewa li bin tavê wê xweş baya, lê newêrîbû. Ger dîsa mêşa kesk bihata û hêk berdaba ser birînê, vê carê wê fermana wî rakiriba. Li saeta xwe nêrî. Hîn yek û nivê nivro bû. Roj ji şevan dirêjtir bûn û hefteyeke din, wê bibana weke hevûdu. Bi şev ji sedema mayîna li hêviya hatina hevalan, bi roj jî ji tirsê hatina mêşa kesk zor dida xwe ku xew neke. Lê wiha bêmêmayînê jî bêtir vejen (enerjî) ji laşê wî dibir û zêdetir ew sist û bê derman dikir.

Ji xwe re got:

- “Ger îşev jî heval neyên êdî halê min xerab e!”

Hat bîra wî ku divê raporekê li ser birîndariya xwe ji partiyê re binivîsîne. Ji xwe ti karê wî tinebû. Dilekî wî got:

- “Niha tam dem e, binivîse”, lê dilê din jî got:

- “Ka hele bisebire, bila îşev jî derbas be. Ger heval bîn hewce nake tu li vir binivîsî, na ku neyên wê demê bi dilekî rehetir tu dikarî binivîsînî.”

Di ber xwe de hizirî. Geh guh da ser wî dilê xwe, geh guh da ser vî dilê xwe. Yek da ber yekî, yek di ser yekî re girt û dawî ghişt wê encamê ku vê şevê jî li hêviya hevalan raweste û ger neyên, sibê, dest bi nivîsandina raporê bike.

Destê xwe avêt bêrîka xwe ku binêre ka kaxez û pênuş li cem heyê, yan nîn e. Ji ber ku çenteyê xwe bi hevalan re rêkiribû, defter û qelema wî jî tê de çûbûn. Heta pîl û teyba xwe jî tê de rêkiribûn. Xwezî çenteyê xwe bi xwe re anîba. Lê çûbû. Dîsa jî di bêrîka yelegê wî de, divîbû hinek kaxez û pênuşek hebaya. Ji ber ku gelek caran bêrîkên xwe vala nedikir û roj dihat giraniya yelegekî û giraniya çenteyekî dibûn wekî hev. Ma çi di bêrîkên yelegan de tinebûn?

Pîl, teyb, radyo, kaset, pênuş, lînuş, kêr, mûçing, neynik, şeh, meqesê nenûkan, meqesê por, banta mezin, banta biçûk; lezeqeya saniyelîk, qetên lastîka reş, qutiya tûtînê, heste, darcixare, tizbî, tornewîd, nasname, destmalk, firçeya diranan, -carcaran sabûn û mecûn, ta û derzî-...

Ev tev bi rehetî di bêrîkên yelegê gerîlayekî de dihatin dîtin û giraniya yeleg bi ser a rext diket. Wê demê bêrîkên xwe se dikirin û tiştên cot û yên her roj nayên bikaranîn derdixistin, dixistin çenteyê piştê. Lê nedigihîşt mehekê dîsa bêrîkên yelegan tije dibûn. Ji bo wê bi xwe bawer bû ku li bêrîkên xwe bigere wê kaxez û pênuşê bibîne. Yelegê xwe ji xwe kir û danî ser rehnên xwe. Yek bi yek li bêrîkan geriya. Sê bêrîkên cot cot li milê rastê, sê bêrîkên cot cot jî li milê çepê hebûn. Li jora van, li her aliyekî, bêrîkeke dîsa cot û di navê de dîsa bêrîkeke fireh a bi zencîr, li her du aliyan hebûn. Di hundirê bêrîka bi zencîr de, du rûpel kaxez û di bêrîka jorê de jî pênuşek dît. Lê pênuş pir hatibû bikaranîn û kêmek hibir di serê wê de mabû. Tegihîşt ku zor têra van her du rûpelan bike. Ji bo wê divîbû tiştên

dixwaze binîvîsîne pir kin û cewherî binivîsanda û ji bo vê jî divîbû  
hişê xwe baş komî ser hev bikraya û pişt re dest bi nivîsandinê  
kiriba. Kaxez dîsa li hev pêça û xist bêrika xwe. Pênûs jî xist bêrika  
jorê. Rahîşt yelegê xwe ku li xwe bike. Lê wekî moriyek gezekê ji  
goştê mejiyê wî veke, veciniqî. Tiştêkî nava dilê wî xurandibû û  
tezînokek bi gincirî di seranserîya nava wî re gihiştibû mejiyê wî.

Di cih de yelegê xwe danî kêlekê û dest bi vekirina şûtika li ser birînê  
pêçandî kir. Dema birîn derket holê raste rast mûçing dirêjî cihê  
kunê kir. Du spîhatiyên wekî du libên birincê li kêleka hevûdu  
dilebitîn. Her du jî yek pey yek kişandin û danîn ser tehtê. Ewqasî  
aciz bibû ku, ji erdê rahîşt zixurekî û pê kurm perçiqandin. Çavê xwe  
bêhneke dirêj li ser birînê gerand, lê tiştêkî din nedît û êdî bi ti  
livandinê jî nedihisiya. Ji ber ku birînê hîn zêde nêgirtibû,  
hewce nedît paqij bike. Careke din şûtik li ser birînê pêça û kefî da  
ser. Êdî roj bi tevahî ji ser laşê wî çûbû û bêhneke din, wê ji derdora  
wî jî vekîşiyaba. Cawbarank kişand ser laşê xwe û pala xwe da tehtê.  
Dilê wî çû berfê, lê kurmên li ser tehtê perçiqandî hatin ber çavên  
wî û dilê wî xeliya. Çiqasî jî zû mezin dibûn?!

Kurmên di nava berfê de hatin bîra wî. Berê nizanîbû kurmên di  
nava berfê de dijîn hene. Hevalên wî qalê kiribûn, lê digot ku, dibe  
ji der ve hatibin, ketibin nava berfê. Pişt re li kunberfên Herekolê bi  
xwe dîtibû û têgihiştibû ku berf dema kevin dibû, kurm ji navê  
diafirîn û bi berfê, xwe bi xwedî dikirin. Her ku berf dixwarin,  
dinepixin û zexm dibûn. Ew jî wekî berfê, spî bûn û cih bi cih ji berfê  
jî spîtir bûn; ji ber ku berfa di kunê de kevn dibû, ji toz û gemarê  
gewr û cih bi cih reş dibû. Di kunberfên Herekolê de jî berfa çend  
sed salan li ser hevûdu kom dibû. Di kelkela germa çelê havînê de,  
dema mirov dadiket hundirê kunberfan, ji sermayê re nikarîbû

bêhnekê rawestiya. Kî dadiket, bi lez qetek berf jê vedikir, dixist nava kefiya xwe û baz dida der ve, ber tavê. Bi şewata germahiya tava çele razî bûn, lê bi dijiwariya serma kunberfan ne razî bûn. Lêbelê kurmên berfê ev jiyan bi xwe xweş anîbûn. Di wê sermayê de, li ser girseya berfê, wiha bi coş digeriyan ku wekî xezalên li ser mêrg û çîmenan, ji jiyana xwe razî bûn. Mixabin dema mirov çav li wana diket, dilê mirov dixeliya û ji berfê sar dibû. Lê li navsera Herekolê jî, xwarina berfê pêwîst bû. Li her aliyê navserê kanî peyde nedibûn. Ji bo wê berf ji kunberfan derdixistin, li ber tavê dihilandin û wiha vedixwarin. Lê yên bê sebir, gilokek berf hildigirtin destê xwe û dikiritandin, dixwarin. Kurm qet ne di xema wan de bû! Lê niha li ber kefiya berfê, du kurmên qasî du libên birincê dilê wî xelandibûn û ew ji xwarina berfê sar kiribûn. Baş bû ku ne kurmên berfê bûn, ên birîna wî bûn. Ji xwe re got:

- “Ka hele vê danê jî ez nexwim, ma wê çî bibe!?”

Serê xwe danî ser tehtê û hişê wî çû ser zozanên Herekolê. Ji Herekolê daket Geliyê Erkent û derbasî Çiyayê Çaçê bû... Li Çaçê li bin darên fisteqan rûnişt û li hêviya hevalên xwe ma. Bêhneke din du hevalên çûbûn berpâlê vegeriyan. Nava kefiyên wana tijê tirî bûn. Danîn ber xwe û xwarin. Yek ji gerîlayên tirî anîbûn dirêjî bejinsitûr bû; di ber xwarina tirî re dest bi axaftinê kir, tiliya xwe bi milê jorê ve vekir û got:

- “Gundê me di vê dolê de ye. Aveke baş lê heye. Hemû dar û ber in. Tu çî fêkî bixwazî lê hene û ava wê têr masî ye.”

Çend lib tirî bi hev re avêtin devê xwe û di nava zimanê xwe û şikefta devê xwe de perçiqandin. Devê wî tije ava şêrîn bû. Şerpinî ji şikefta devê xwe anî û gotina xwe domand:

- “Ez bawer im, hevalê Egîd jî ji van rezan tirî xwariye û kî dizane dibe ku ew jî wekî me li binê vê darê rûniştibe. Ev ziyaretek têr dar e. Mirov ji dîtina derdorê diparêze. Dibêjin, dema hevalê Egîd û yekîneya xwe çûne ser bajarê Erûhê ji Çaçê bi rê ketine. Çaçê jî ev der e. Meha Tebaxê jî, dema tirî ye. Ez bawer im wê tirî li vir xwaribin û çûbin ser bajêr. Xwezî we ew şev bidîta! Heta sibehê dengê fîşekan li ber guhê me bû. Me kesî nizanîbû çî diqewime û em tev şaş mabûn.”

Anî bîra xwe ku ew jî şaş mabûn. Di roja panzdehê Tebaxê de li Zindana Amedê bû. Li ser ranzeyaya xwe dirêjkirî, pirtûk dixwend. Hin hevalên wî rojname dixwendin. Hinek ji xwe re digeriyan, hinekan sohbet dikirin. Li saeta xe nêrîbû ku kêmek ji nûçeyan re mabû. Pirtûka xwe bi devikî danîbû kêleka xwe û li televîzyonê temaşe dikir. Serê hevaleyê diket ber wî û baş nedidît, lê deng xweş dihatiyê. Mûzîka destpêka nûçeyan lê da. Nûçeyan dest bi axaftinê kir û bi axaftinê re bêdengbûnek ket ser tevahiya girtiyan. Herkes ji cihê xwe qiliqîbû û xwe nêzîkê televîzyonê kiribû. Dema nûçeya yekem bi dawî bû, wekî zelzele biqewime her yekî xwe bi awayekî hilevêtîbû jorê û li çepikan dabûn, dest bi tilîliyan kiribûn. Nema dizanîbûn çî bikin. Bi carekê re hemû zîndan serûbin bibû û xilxileyekê girtibû ser giştîya qawîşan. Herkes bi herkesê re diaxift û digotin:

- “Te dît.?! Pir baş kirine. Min dizanîbû wê rojekê heval vegerin welêt û şer dest pê bike!

- “Bi rastî min jî digot wê werin, lê ne evqasî zû.”

- “Na, na; ne zû ye. Hîn di 82an de divê vegeriyabana; lê nizam çima evqasî dereng ket. Ez dizanim par çend hevalên ji propaganda

çekdarî hatibûn girtin hebûn. Min ew li dadgehê dîtibûn. Wê demê min dizanîbû ku rojê wiha nêzîk e!”

- “Wele dereng-nêzîk; baş bû. Dilê min rehet bû. Ger ne wiha be, ev segbavên Tirkan rehet nasekinin.”

- “Niha wê kerbê wan di serê me re derxînin.”

- “Bila derxînin. Bila heval li wan bidin; bila ew jî kerbê wê, di serê me re derxînin; çi nabe!”

- “Ez bawer nakim bi ser me de werin. Tam berûvajî wê, ji me re dibe piştqewîniyek. Heta niha digotin; ‘Apocûlar bîttî’ û îşkence li me dikirin; ka niha wê çi bêjin û çi bikin?”

- “Hema çi dikin bila bikin. Ger li der ve şer dest pê bike, êdî ti kes nikare piştta me bîne erdê.”

- “Baş bû, baş bû, xwezî her roj çalakiyek wiha pêk were.”

- “Tê bibinî, partî li ser vê nasekine, wê ev çalakî bidomin!”

Bêhna wî vebibû, laşê wî rehet bibû. Dilrehetiya di wê rojê de bihîstibû, dîsa hatibû ser laşê wî. Her ku Herekol û Çaçê dihatin bîra wî, ew roj û bi wê rojê re jî zîndan dihat bîra wî. Li zîndanê çi kişandibû û çi nekişandibû?!

Jiyana li zîndanê anî ber çavên xwe. Rojên îşkenceyê derketin pêş; rûyê wî hat givaştin û tirş bû. Çavên wî qurmiçîn. Dilê wî teng bû. Çavên xwe girtin û ew roj ji bîra xwe qewitandin. Zor da hişê xwe û bir ser cihekî din, demeke din ku ji bîranînên li zîndanê dûr bikeve... Ji zîndanê tehliye dibû, birayê wî li der ve ew himbêz dikir...

Ew jî ji hişê xwe qewitand. Tişteke ku girêdayî zîndanê xweş be jî, nedixwest bîne bîra xwe. Lê bixwaze nexwaze di her bîrkolanê de, wekî kayê bidêre, bîranînên zîndanê berba dibûn û hildibûn; tije çav û guhê wî dibûn. Êdî kîjan hiş dikarîbû ji ber wana bireviya? Lê vê carê bi biryar bû, piştî bîranîna roja Panzdehê Tebaxê, nedixwest

hişê xwe li zindanê bihêle. Hizirî ku çî bîne bîra xwe. Çend sahneyên jiyana xwe di ber çav re derbas kirin. Lê hişê wî ji wan negirt. Dîsa bîra xwe vekola, lê ti bîranînek ku wiha ramana wî bibe dûr, nehat ser hişê wi. Ji xwe re got:

- “Ger hişê te hebaya, ji xwe tu ne diketî zîndanê, ne jî niha li bîranîneke derveyî zîndanê digeriya. Te li der ve jiyana nekiriye ku tu li bîranînên xweş digerî. Ji bo miroveki salên bîranînên xweş, salên di navbera bîst û sîh î de ne. Ciwanî di wan salan de ye û xweşiya jiyana mirov jî ciwaniya wî ye. Te ciwanî di zîndanê de borand. Niha tu çî ji bîranînan dixwazî?”

Dev ji zordayîna hişê xwe berda. Êdî ji bo wî ne xem bû. Çî dihat bîra wî dikarîbû bihata. Ha li zîndanê, ha li derveyî zîndanê çî ferq dikir. Niha ev cihê lê bû jî, zîdanek bû. Ne wekî ya li Amedê bû, lê di encamê de, li vir jî girtiyê dijmin bû. Dijmin ew birîndar kiribû û hiştibû li van erdan. Navbera wî û dijmin bi meşa lingan rêka niv saetê yan hebû, yan tinebû. Dibe ku dijmin bihata ser laşê wî û ew bikuştî jî. Qet nebe li zîndanê bi dehan hevalên wî li kêleka wî hebûn, li vir ew bi tena xwe mabû!

Hişê wî hinekî belav bibû. Êdî xwe pêwîstê lêgerîna bîranîneke xweş an xerab nedidît. Neynika xwe ji bêrîka xwe derxist. Dixwest hinekî li xwe temaşê bike. Wiha bi carekê re hatibû aqilê wî ku li rewşa diranên xwe binêre. Diranên wî roj bi roj spîtir dibûn. Ger wiha bidomiya, çend rojêke din wê diranên wî, wekî berfa dixwar lê bihatana.

Neynik bir pêşberî xwe û devê xwe ji hev vekir. Ji milê hundir ve diranên wî hîn qehweyî bûn. Ji xwe re got:

- “Hemû ji çixarê û çayê wiha lê hatiye. Teîn û nîkotîn, bi ser hev ve hişk bûye. Tê bibînî; ez ji vê rewşê derkevim, ezê herduyan jî biterikînim!”

Tornavîda biçûk ji bêrîka xwe derxist û bi serê wê, qehweyîtiya li ser diranan yek bi yek jê paqij kir.

Dema ji paqijkirinê destên wî, çav û algûşkên wî westiyan, biryar da ku êdî heta qehweyîtiya li ser diranan jê biçe, rojê çarîkekê bi paqijkirina diranên xwe dakeve.

Piştî diranan li çavên xwe nêrî. Çiqase qermîçok li kêlekên çavan vedijeniyan!? Bi tiliya xwe qermîçok rast kirin. Goştê ruyê wî sist û fireh bibû. Got:

- “Goştê binê çerm tev hiliyaye. Mirov ji ber çi wiha zû dihile?!”

Pirsa xwe dîsa bi xwe bersivand û keniya;

- “Xwîna golikekê ji te çû birayo, ma tu dizanî ku tu ji mirinê filitiye!”

Riha wî baş dirêj bibû. Bin çena xwe xurand û têgihîşt ku tayên rîha wî li wê derê çiqasî bi tov û hişk in. Destê xwe di ser ruyê xwe re bir eniya xwe û pêşenîka xwe hilgavt; nêvî zêdetir porê wî spî bibû. Got:

- “Tiştê maye jî, wê di van rojan de spî bibe!”

Neynika xwe pêça û xist bêrîka xwe. Dîsa birçîbûnê zor dabû nava wî. Destê xwe avêt kevçî û berf kola. Wekî mast bixwe wiha bi rehetî ser kevçiyê wî tije dibû û hênkahî dida ser zimanê wî û nava dilê wî. Heta ku têr xwar, hişê wî neçû ti deran. Piştî têrbûnê, kevçiyê xwe di berfê de çikand û biryar da ku destavê bike. Ji mêj ve bi tengbûna xwe dihisiya. Lê her li paş dixist.

Her du destên xwe dan erde, ji erdê hêz girt û laşê xwe bi kêlekê ve bir. Pişt re rahişt lingê xwe û anî rasta laşê xwe. Careke din, careke din.. .Ji cihê lê radiza gav û nîvekê dûr ketibû. Doxîna xwe vekir û pêdiviya avrijanê pêk anî. Gurçikên wî sist bûn. Wekî bargiraniyek ji



ser milê wî çûbe, xwe rehet dît. Cardin doxîna xwe şidand û çawa hatiye, wiha vegeriya cihê xwe. Êdî çavên wî li avaçûna rojê û hilatina heyvê bû ku hevalên wî bihatana di hawara wî de...

\*\*\*

## SÊZDEH

Dikarîbû bêhnekê serê xwe deyne û bîra xwe vekole ku dem zû bibore. Hevala wî hat bîra wî. Evqas sal di navberê re derbas bibûn, hîn bi hesret bi bîr dianî. Evîna yekem qet ne dihat jibîrkirin. Gelo wê rojek hebaya ku çavên wî lê biketana; wekî wê roja li ber deriye wan rawestiya bû...

Dawî rêka wî bi Rihayê ketibû; dema azmûnan (îmtîhan) bû. Ji xwe gotibû:

- "Ger rêka te bi Rihayê bikeve, pirsyara min bike."

Destpêkê bawer ne fikir ku rêka wî bi Rihayê bikeve, lê va ye hatibû. Hevalên xwe yên li wir dibistan dixwendin jî dîtibûn. Wan jî dizanîn ku hez ji hev dikin. Dema pirsyarî kir, hevalê wî got:

- "Li mala meta xwe dimîne, ez dinasim." Û ketibû pêşyê, wî biribû ber derî. Heta çûbûn ber derî her tişt xweş derbas bibû. Lê dema li ber derî rawestiyan, kebên wî sist bûn û tezînok bi laşê wî ketin. Germahiyekê da ser dilê wî û şermê da ser ruyê wî. Ji xwe re got:

- "Ya ku yekî din derkeve ber derî û pirsyarî bike, 'Tu kî yî, tu çi dixwazî?' wê çi bersiv bidaya? Wê nebêjin; 'Çi karê te li ber deriyê nenasekî/ê heye?' Ya ku bêjin, 'Tu li pey keçên xelkê çi digerî?' û şer bikin?!"

Germahiya ser dilê wî, cihê xwe da xov û tirsê. Wêr da xwe û got:

- "Kî çi dibeje bila bêje, hevala min a dibistanê ye û ez hatime serdana wê, ma qey qiyamet ranebûye!"

Lê xova di dilê wî de, peyv jê digirt û digot:

- "Tu xwe nexapîne, qey hayê te ji irf û adetên civakê nînin? Hûn ne mirovê hev in jî ku pirsyariya hev bikin! Dibe ku keç were ber derî û bêje:

- "Çi karê te li vir heye, tu çima bi pey min ketiyî?" Dibê ku êdî te jibîr kiribe! Ya baş hîn serê te neketiye ti belayê, paş de vegere..."

Lê ji bo paşdevegerînê êdî dereng bû. Hevalê wî, bi pişta destê xwe çend caran li ser hev li deriyê ji text xistibû û xwe dabû kêlekê. Lê ew hîn di nava hest û ramanan de, li ber derî radiwestiya. Wiha di cihê xwe de cemidî mabû. Derî bi zirqîniyekê vebû û keçek sêzdeh-çardeh salî serê xwe derxist der ve. Ew di cih de nas kir:

- "Merheba"

- "Merheba, xêr e?"

Keça sêzdeh salî, bi pirsaxwe re yê li ber derî nas kirin û ji şermê re bi dengê bilind bang li hundir kir:

- "Ablaa, bak kîm gelmîş?"

Ev bangkirina watedar di guhê wî re derbasî mejiyê wî bû û xwe berda ser dilê wî. Dilê wî kir gurme gurm. Xwîn di rehên wî de coşiya û lez da xwe. Hinarkên ruyê wî heta memikên guhên wî di nava xwînê de sor man. Tezînok bi nava wî ketin. Gotina, 'binêr kî hatiye' pir li xerîbiya wî çûbû. Diyar e, berê li ser wî, di navbera xwe de axiftibûn û li hêviya hatina wî bûn. Neptî hevala wî li ber derî diyar bû. Hîn cilên wê yê rûniştinê li ser bûn. Porê wê wekî dema li dibistanê, dîsa dadiketin ser milên wê. Çavên girs ên zeytûnî û hinarkên sor ên sêvînî di nava spehîbûna ruyê wê de dibiriqîn. Dema çav li wana ket, keniya û baqeke gulên sor li ser lêvên wê yê lihevhatî vebûn.

- "Hûn bi xêrê hatin."

- "Xêredar bin."

- "Em derbas dibûn, me got em pirsyariya we bikin."

- "We pir baş kir. Kerem kin derbas bin, li ber derî nerawestin."

- "Sax bî, em narûnên, bes me got em we bibînin."

Hevalê wî dît ku di derbasbûna hundir de bêdilî, yan tirsê jiyana dike. Wî jî piştî keşan girt û xwest derbasî hundir bibin. Lê carekê înta wî girtibû û serî nedidanî. Wekî sêhrek li ber be û ger derbasî hundir bibe wê ev sêhr betal bibe, wiha lingên wî ew paş de dikişandin. Bi dîtina evîna xwe dilşa bibû û ev ji bo xwe bes didît. Xatirê xwe xwest û destê evîna xwe givaşt. Nermahiya goştê wê ghişt heta hinava wî û dilê wî ricifand. Zû li xwe zivirî û ji kolanê dûr ket. Dema ghiştin pêşya avahiya xwendevanan, hevalê wî kotekî ghiştîyê û bi ser de qêriya:

- "Tu tirsonekê xwedê yî. Yê wekî te tirsonek ti caran nagihêjin miradê dilê xwe. Ji doh ve tu li ber min digerî ku em biçin mala wana. Dema em diçin ber derî jî, newêrî derbasî hundir bibî! Ev çi helwest e, ez têngihiştim. Gelo tu ji xwe pirsyar dikî? Niha dilê keşan jî ji te maye, ewqas berger kirin ku em derbasî hundir bibin. Te eciband, karê te kiriyî?"

Lê hişê wî ne li ser van gotinan bû. Rast e ku poşman bibû û di dilê xwe de dixwest derbasî hundir bibana. Li cem rûniştiba, çayek ji dest vexwariba, rojên li dibistanê bianîna bîra hevûdu... Lê ewqas ji xwe re zêde didît. Bes dîtina wê hesreta wî bû û ev hesret borandibû. Dizanîbû wê kîjan rojê, li kîjan dibistanê bikeve azmûnan jî. Ev dihat wê wateyê ku berya vegere, wê careke din hevala xwe bidîta. Êdî gelo kes ji wî bextewartir hebû? Lê hevalê wî, hîn di ber xwe de diaxift û henekê xwe pê dikir:

- "Ger evîndar hemû wekî te bin, xwelî li serê evîndaren be."

Çavên xwe ji hev vekirin, gire gira jeneratora li ser girê dijmin, hatibû ber guhê wî. Rojê hemû tîrêjên xwe ji Gelî kişandibûn. Çariyeke gewr xwe li ser berpâlên çiyê pêçabû. Li ezmên nêrî; ew jî gewr bû, lê dîsa jî di kurahiya ezmên de stêrkek diçirisî. Gelo ew ne sitêrka wî bû?

Li saeta xwe nêrî, nû bi ser heştê êvarî diket. Hîn du saet ji hatina hevalan re hebû. Di van du saetan de dikarîbû biçûya cîhana xeyalan, lê divîbû xew nekiriba. Tam di wê bêhnê de, dilê wî çû berfê. Rahîşt kevçî û tije berf kir, bir ber devê xwe, piç bi piç mîjt û kolanên Rihayê li ber çavên wî dirêj bûn...

- "Azmûna te çawa derbas bû?"

- "Li gorî min, pirs pir rehet bûn."

- "Ez jî wiha difikirim."

Dîsa heyecanê girtibû ser leşê wî. Dizanîbû ev dîtina dawî ye. Careke din kî dizane li ku derê li hev rast werin an neyên. Ji bo wê nedixwest ev dem bibore. Lê rêk di bin lingên wan de, her gav bêtir bi dawî dibû û ghiştibûn ber deriyê hesin ê şîn. Kurê meta wê, bi teqsiya xwe hatibû ber derî, li hêviyê radiwestiya. Destên hev hejandin û destên wan ji hevûdu veqetiyan.

- "Guhdarê xwe be. Carê serî li me bide. Me jibîr neke."

- "Tu jî..."

Gotinên wî nivçe mabûn. Deriyê erebê hatibû girtin û wekî mareke reş herikîbû û çûbû. Wiha li cihê xwe sar mabû. Gotinên wê yên dawî, li ber guhê wî dipengizîn û hişê wî ji serê wî dibirin; hezkirina wî zêdetir û bilindtir dikirin. Çavên wî li ser rêkê mabûn û hesretê ji niha ve dest bi dilşewitînê kiribû.

Êdî demeke dirêj bi vê hesretê şewitîbû. Vegeriyabû bajarê xwe. Meh û sal derbas bibûn. Êdî li kolanê Enqerê bû. Sê salên dibistanê

li Stenbolê ji evîna xwe dûr û bêxeber qedandibûn. Niha diçû Wezaretê Çandiniyê ku kaxeza tayîna xwe bistîne. Di otobûsa belediyê de li milê camê rûniştibû. Serê xwe sipartibû camê û li der ve temaşe dikir. Dizanîbû ku çavên wî li tiştê digerin, lê nizanîbû bê li çi digerin. Wiha valatîyek him di jiyana xwe de, him di gera awirên xwe de jiyana dikir. Li kêleka rê wekî du lehiyan mirov diherikîn; hin evraz diçûn, hin sernişûv dadiketin. Otobûsa lê swarbûyî bi xwe jî, serevraz diçû. Ji bo wê mirovên sernişûv dadiketin li ber awirên wî diketin û bi lez wînda dibûn.

Bi carekê re veciniqî. Serê xwe ji camê vekişand û li pey xwe nêrî. Lê ji qelebalixa (şênîya) mirovê diherikîn tiştê nedît, bes ji dîtina xwe ya destpêkê bawer bû. Ew bû! Ruyê wê, porê wê, bejna wê tev ew bû! Bi carekê re xwîna laşê wî germ bibû û rabibû coşê. Di cihê xwe de neradiwestiya. Devê xwe tije kir ku bang li ajovan (şofor) bike û bixwaze otobûsê rawestîne. Lê hat bîra wî ku şofor bi ya wî nake û wê vala vala xwe bihetikîne. Gelo rawestgeh pir li dûr bû. Na! Wa ye komek mirovên rawestiyayî diyar bibû. Kêmeke din rawestgeh jî diyar bû. Bi lez ji cihê xwe rabû û çû ber derî ku çawa raweste, dakeve û sernişûv bazde!

Otobûs heta gihişt rawestgehê û deriyên otomatîk bi tisîniyekê vebûn ne zêdeyî deqîqeyekê dem derbas bibû. Lê li ber dilê wî wekî saetek derbas bûbe wiha dirêj hatibû û ti xeber nemabûn ji şofor re rêz nedikirin, ji ber ku erebe hêdî diajot û derî dereng vedikir.

Bi vekirina derî re xwe avêt der ve. Hindik mabû lingê wî bialîqe û bi dev û rû ve biçê ser betonê. Lê zû xwe komî ser hev kir û bi gavên bi lez û bez sernişûv daket. Awirên xwe heta jê dihat dirêjî pêşya xwe dikir ku çel-pêncî gav pêşya xwe baştirîn bibîne.

Vê êvarê jî hemû keçên ciwan ên vî bajarî derketibûn ser vê rêke! Porên wan ên reş û qehweyî dadiketin ser milên wan. Ji dûr ve dişibiyan hevala wî, lê dema nêzîkatî li wana dikir, dizanîbû ne ew in û awirên xwe hîn pêşdetir dibir, gavên xwe hîn bi lez û beztir diavêt. Lê her ku bi jêrê ve diçû, lehiya keç û mirovan zêdetir û dirêjtir dibû...

Wekî dilopek ji ava di nava behrê de, li Meydana Kizilayê nû hişê wî hat serê wî ku gera wî bê fêde ye. Dema nû dît divîbû yan otobus bida rawestin, an jî li camê bidaya ku hevala wî bibihîsta û bisekiniya. Lê her du jî nekiribû û niha di kadînê de, li derziyê digeriya...

Bi gindirîna berekî veciniqî. Li saeta xwe nêrî. Saet hîn nehê şevê bû. Bawer ne dikir ku hevalên wî ewqasî zû werin. Ji xwe ber jî êdî nedigindirîn. Xuya ye ew berê gindirî, ji binê lingê ajalekê gindirîbû. Ger hevalên wî bana wekî şeva hatibûn cem, wê xiştinî her bidomiya. Lê li gorî ku rawestiya bû, ne ew bûn. Wekî din, ji bo ku di vê saeta zû de bihatana, divîbû bi roj navser qut kiribana. Gelo wê biwêrîna wiha bikin? Kî dizane? Belkî jî ew bûn, bi hişyarî dimeşyan û kevir ji ber lingên xwe nedigindirandin. Ji xwe heyvê ronahiya xwe dabû ser rêkê û wekî tava rojê ronahî dikir.

Guhê xwe da ser dengê xwezayê. Wekî li ber ba bikeve û biçe gire gira jeneratorê dihat û diçû. Wekî din, xweza kerr û lal bû. Ji xwe re got:

- “Ev bêdengiya berya bahoz û tofanê ye!”

Çûna cîhana xeyalan lê xweş dihat. Wiha hizirî ku xwezî aqilê wî ye îroj, doh pê re hebaya! Lê mirov, herdem hişê wî, dema derfet ji dest direviyan dihat serê wî. Bi sedan, bi hezaran derfet ji dest xwe revandibûn. Di ewqas salên xwendina dibistanê de, carekê tenê jî

neçûbû serlêdana wê. Tenê carekê havînê telefonê vekiribû mala wê ku pê re biaxive. Wiha xeyal dikir ku wê ew, an xuşka wê telefonê rake. Lê bavê wê rakiribû û bi dengê xwe yê qebe pirsyarî kiribû ku kî ye? Dev û lêvên wî bi hev ve kilît bibûn û yek gotin ji devê wî derneketibû. Lê bavê we bêtir bi heter (israr) dipirsî:

- “Tu kî yî, kê dixwazî?”

Bîr bir ku ahîzeyê deyne. Baş bû ku dikandar dost bû û ji ber bi danûsitendinê daketibû, zêde ferq nekiribû. Kêmekê bala xwe bidaya ser, wê bidîta ku çawa sor bûye û diricife. Tenê ji dûr ve pirs kiribû:

- “Tu axift?”

- “Ne li mal bû?”

Wî bi xwe jî ji derewa xwe bawer nekiribû û ditirsiya ku bavê keçê ji postaxanê pirsyarke ka bê telefon ji ku derê jê re hatiye. Wê demê wê her tişt derketa ber çav û tev li hev bibaya. Ji bo vê divîbû bêhneke din li ber telefonê rûnişt û nehiştaya ku dikandar biaxifta. Dizanîbû ku bavê hevala wî yêkî, kuşkuşe bû û dikarîbû şer derbixista. Tewra kê, li cem xwe wiha lê dinêrî. Kî dizane dibe ku mirovekî dilnêrm bû jî, lê qilafetê wî yê girs û herdem li dikana yê araqfiroş rûniştina wî, nêrîneke wiha dabû ser. Jî bo vê jî, nediwêriya pê re biaxive û xwe nêzî wî bike. Ji ber van nêrînên lê peyde bibûn, her dem ji bavê hevala xwe tirsiyabû. Bihîstibû ku dayika wê oldar bû û tim çarşefa reş li xwe dipêça. Ev tev bûn sedem ku neçe mala wana û her bi hesreta dîtina wê, salan biborîne.

Roja li dibistanê dabûn pey hev û destê wî hatibû valatîyê, li pêsêra wê ketibû hîn wekî doh dihat ber çavên wî û nermahiya pêserê, wekî wê gavê di nava dilê xwe de dibihîst. Lê ji wê rojê û vir ve tam pênc sal derbas bibûn û niha bihîstibû ku li gundekî Amedê bûye

Mamoste. Lê kîjan gund bû nizanîbû. Niha li ser rê bû ku dest bi kar bike. Yek qirûş pêre jî di bêrîka wî de tinebû. Kêm kêm divîbû sê-çar mehan raweste ku hinek pere bixe ser hev, destûra pazdeh rojan bistîne û biçe Amedê pirsyariya wê bike, bibîne û biaxive. Vê carê her du jî azad bûn û ji tişteki neditirsiyan ango tişteki wana bitirsîne tinebû. Êdî bi rehetî dikarîbûn werin cem hev, hezkirina xwe heşkere bikin û bi hev re jiyana xwe bikin yek.

Amadekariyên xwe li ser vê kirin, lê tişteki hesap nekiribû!

Êdî bibû xwediye kareki û maleke. Di qonaxa hukumetê de giraniya karê wî hebû. Gundî, gel, şoreşger pê hewce bûn. Dem bi dem dihatin mala wî yan jî ew diçû cem wan û bi saetan diaxiftin. Rojekê şoreşgerê –ku berê mamoste bû, lê ji ber eşkerebûnê êdî li çiyê veşartî dima- ew xwestîbû cem xwe. Ji ber ku berê hevûdu dinasîn, rabû lê xist û çû cihê şanî dabûn. Ne kêmi sê saetan li çiyê meşiyabûn. Dawî hatibûn şikefta Çala Xanê. Li wir heta sibehê deqtilo nivîsîbû. ‘Serxwebûn-hijmar 1.’ ji ber zêde fikir. Hevalê wî ye mamosteyê kevn digot:

- “Divê em pir zêde bikin û li gelek deran belav bikin. Me mekîneyek teksîrê jî aniyê lê kesî jê fêm bike nîne.”

Gotibû, ew bi xwe kêmekî jê fêm dike. Ji bo wê qewl dan hev ku heftiya bê dîsa roja Şemî û Yekşemê hevûdu li wir bibînin û biçin mekîneya teksîrê bikar bînin. Lê mekîneya anîbûn bê hibir bû. Mamosteyê kevin got:

- “Xortan ew ji Lîseyê anîn. Dema ez li wir mamoste bûm di bin berpirsyariya min de bû û ji ber vê yekê min cihê wê zanîbû. Min ji xortan re baş dabû nasîn, lê ji heyecana çalakiya yekemîn, qutiyên hibrê jibîr dikin û naynin. Niha divê em hibrê peyde bikin.”



- “Hibir zahmet e, ji ber ku ji aliyê Rêvebiriya Pihêt ve li ser kirîn û firotina wê tê sekinandin. Bi vê sedemê bê ruhsat nafirosin. Lê ezê biceribînim û bawer im ku bikaribim bi dest bixim.”

Roja din li erebê siwar bibû û çûbû bajarê Midyadê, pirtûkgehê. Dema pirsyariya hibra teksîrê kiribû, firoşger bi çavekî pirsyarî lê nêrîbû û gotîbû ku wê çibike ji hibra teksîrê?

Dizanîbû ku firoşger niha bi yek qîrdayînê yan telefonê dikarîbû polîsan li ser serê wî kom bike. Ji bo vê bi xwînsarî nasnameya xwe ya memûrtiyê derxist û bi dengê nerme got:

- “Ji bo xebatên me pêwîstiya me pê heye.”

Firoşger dema nasnameya memûrtiyê dît, hinekî sist bû û pirsyarî kir bê çend qutiyên dixwaze.

- “Niha çar qutî bes in; dema têrê nekir, ezê dîsa werim bixwazim.”

Firoşger kara ji çar qutiyên nikarîbû zû bi zû bi avê de berdaya. Diyar bû ku di dilwaswasiyekê de bû. Lê dawî çar qutî hibra teksîrê xist nava kaxezekê û ew jî xist hundirê kîsekî reş û da dest. Ji xwe heqê wê ji mêj ve danîbû ser masê. Rahîşt kîsê hibir tê de û bi lez ji wê derê dûr ket. Heta ji bajêr derketibû jî, digot qey wê firoşger poşman bibe û bi polîsan re bi peykeve. Lê kesek bi pey de nehatibû û bi hêsanî ghiştibû cihê xwe. Roja Şemiyê jî berê xwe dabû şikefta mekîne lê bû û ew û hevalê wî yê mamosteyê kevin, bi şev û roj xebitîbûn ku rûpelên Serxwebûnê zêde bikin.

Di vê navberê de ji terq û reqa zîvirandina milê mekîneyê şivanekî li derûdorê pez diçêrand hatibû ber şikeftê û serê xwe di derî re dirêj kiribû, ka bizanibe bê li hundir çi diqewime. Her du heval bi karê xwe ewqasî mijûl bûn ku demekê şivan ferq nekiribûn. Şivanê reben cara yekem mirovên wiha di şikeftê de, karekî ecêb dikin didît û bi mereq temaşe dikir. Carekê hevalê wî serê xwe ji kar rakiribû û

bi şivên re rû bi rû hatibû. Şivan ji şerma kifşbûnê re dev û lêvên wî li hev herbilîbûn û bi lez gotibû:

- “Bira xwedê qeweta we bide. Ev çi kar e hûn dikin?”

Hevalê wî ji xwe ji pirsgirêkên bikaranîna mekînê berê teng û aciz bibû. Bi bejna xwe ya kin xov nedida dilê kesî lê, bi simbêlên xwe yên zir û awirên xwe yên tûj, kesekî nikarîbû pê re çav bi çav bihata. Gotina şivên di dev de hişt û bi ser de hil bû:

- “Çi ji te re lazim e, em çi karî dikin? Çi îşê te li ber derî heye? Biqêşit biçe ji wê derê! Ma bi serê te ketiye? Tu ji kesekî re jî qala me bikî, ezê te bikujim, bila hayê te ji te hebe!”

Rebenê şivên nema dizanîbû çi bêje û çi bike. Dev û lêvên wî li hev herbilîn û bi lez xwe da paş. Di dil xwe de digot; ka bê bi cinan re axiftiye, li çi ecêbê rast hatiye...

Piştî karê xwe xelas kirin, êdî pêwîst mabûn ku tiştên di şikeftê de bibin cihekî din, bi cih bikin. Hevalê wî ji bo şivên digot:

- “Pîsê heram; ger nehatiba ber deriyê şikeftê, hewce nedikir niha em evqase bar ji vir rakin, bibin cihekî din!

Bi kirina karên wiha re, êdî her roja şemî û yekşemê li çiyê bi Apociyan re dema xwe diborand. Her pênc rojên din jî li qonaxa hukûmetê karê memûrtiyê berdewam dikir. Demekê xwestibû ku dev ji karê dewletê berde û bi tevahî li çiyê bimîne. Lê hevalên wî ev daxwaza wî nepejirandibûn û gotibûn ku li bajêr bimîne, bêhtir wê bi kêrî karê wana were.

Bi rastî jî wiha baş kar dikir. Bi rehetî dikarîbû bikeve cihê gelheyê (nufûs), nasnameyan ji bo hevalên xwe yên li çiyê çêbike, mohr û îmze bike û bigihîne wana. Navbera wî û cîgirê midîrê gelheyê wekî şekir û şerbetê bû. Cîgir zilamekî tenikî dirêj bû; rengê wî di navbera zere û sore de bû. Ne kêrî bîst salan jê mezintir bû. Di temenê wî

de zarokên cîgir hebûn. Ji xwe keçeke wî ya di temenê wî de hebû kû bi xweşikbûna xwe nav û deng dabû. Ruyê wê spî û dagirtî bû, çavên wê ewqasî girs û lêvên wê ewqasî şêrîn bûn ku hesreta xortan, dîtina wê bû. Lê ji sedema ku di bajarokekî biçûk û civakeke girtî de dijiyan keçik zû bi zû dernediketin der ve. Yên li mala wana dibûn mêvan, pişt re di civatên xortan de qala xweşikbûna wê dikirin û bi saetan li ser keziyên wê yên di rengê sifirê de diaxifin... Tam di wê bêhnê de bavê wî agahiyek jê re rêkiribû û bi girtina vê agahiyê berê jiyana wî tev bi carekê re hatibû guhertin. Li gorî agahiyê leşkerên girêdayî qereqola Sitifîlê, girtibûn ser dibistana gundê Xerabêbaba ku birayê wî lê mamoste bû û xwestibûn wî bigrin. Lê gundiyan berya leşker bigihêjin gund, agahî gihandibûnê û birayê wî ji gund derketibû. Leşkeran li gund, sê roj û sê şevan, li derdora dibistanê kemîn danîbûn ku mamoste were û wî bigrin. Lê birayê wî careke din venegeriyabû dibistanê û bavê wî di agahiyê de dixwest ku ew ji hevalên li wê herêmê dinase bipirse, bê ka li ku derê ye...

Bi vê sedemê, hevalê xwe yê mamosteyê kevin dît, tiştê bihîstiyê jê re got û pirsyarî kir ku li herêma Omeryan heval hene yan nînin. Dema bihîst ku kêmek heval li aliyê Bagokê hene û dem bi dem diçin aliyê Omeriyar jî, parolaya di navbera wana di girt û biryar da ku biçê wê derê, li birayê xwe bigere.

Çend meh bûn amadekariyên ji bo dîtina evîna xwe dikir, qulipand ser lêgera birayê xwe. Destûr a xwe ya salê girt û li erebê siwar bû, çû Bagokê, li gundên yezîdiyan li hevalên xwe rast hat. Parola da wan û xwe bi wana naskirin da. Pişt re sedema hatina xwe got. Hevalên wî yên li wir vegotin ku baş birayê wî dinasin û xebera wana

ji sergirtina gund a dijmin heye, lê birayê wî çûye ku derê nizanin û ew jî lê digerin ku wî bigrin cem xwe, hilgirin saxlemiyê û gotin:

- “Ger dema te hebe û tu bixwazî, tu dikarî çend rojan li cem me bimînî û em pirsyariya birayê te bikin.”

Ev nêrîn ketibû serê wî û êdî her roj bi wana re gund bi gund, mal bi mal digeriya. Li kul û derdên gundiyan Kurd guhdarî dikir, rewşa wana bi çavên xwe didît. Xwarina wan û livîna wan parve dikir. Li propagandayên şoreşgeran guhdarî dikir û li cihna jî, ew bi xwe jî, tev li propagandayê dibû û tiştên dizanîbû dixwest bi gundiyan bide fêmkirin. Lê tiştê hebû ku gundiyan fêm nedikirin û şoreşgeran jî zêde nedikarîn bi wana bidin fêmkirin. Ew jî pevçûnên di navbera rêxistinên Kurd de bûn. Digotin:

- “Doh KUKçiyên li Nisêbînê xortek ne sêle kuştine. Ger Kurd Kurdan bikujin, hûnê çawa şoreşê çêbikin?”

Di vê xalê de şoreşger diketin tengezariyê û bersiveke têr nedidîtin ku bidin.

Wiha pazdeh roj li wan gundan qedandibûn. Ji Dêrbagok heta Dêrmarok gelek warên kevnare yê dîrokî dîtibû û bi rewşa wan a di halê xwe de hildiweşiyên dilxemgîn dibû û di dilê xwe de digot; ‘Ger welatek bêxwedî be, wê rewşa mîratên dîrokî jî wiha be!

Dema bîst rojên wî qediyên û dît ku hîn derfeta derbasbûna aliyê Omeryan bi dest neketiye û ti salox ji rewşa birayê xwe negirtiye, hizirî ku dakeve bajêr û bi malê re bikeve têkiliyê wê baştir bibe. Dibe ku wana heta niha agahiyek jê girtibin. Ji bo vê xatir ji hevalên xwe xwest û di ser gundê Marînê, di ber şikeftên dîrokî re, daket bajêr. Li bajêr telefon ji malê re vekir û têgihişt ku di texmîna xwe de rast e. Birayê wî xeber ji malê re rêkiribû ku sax e û rehet e. Xwestibû xema wî neyê xwarin.

Dilê wî rehet bibû û vegeyabû ser karê xwe, lê êdî heta qirikê ketibû nava kar û xebata şoreşgerî. Hevalê wî ye mamosteyê kevin, ji herêmê çûbû û derbasî Libnanê bibû. Li gorî gotina şoreşgerên din ên dinasî; Apo li Libnanê wargeheke perwerdeya gerîlatî vekiribû û dixwest ku kadroyên bikaribin, divîbû sînor derbas bikin û xwe bigihênin vê wargehê. Ger ne derew be, digotin Kemal Pîr ji bo vî karî ji wargehê hatiye û derbasî Batmanê bûye. Hevalê wî ye mamosteyê kevin jî, jê re xeber hiştibû ku, karê xwe ye şoreşgerî bidomîne û hêviya wî neşikîne!

Piştî şeş mehên din, dema bavê wî bi armanca dîtina wî hat cem, êdî bîrûbaweriya wî tev li ser kar û xebata şoreşgerî bû. Qeymeqam carekê ew xwestibû cem xwe û hişyarî dabûyê, gotibû ew wekî giştîya memûran tev nagere û guman li ser heye ku têkiliya wî bi Apociyan re heye. Ev yek nepejirandibû û guh nedabûyê. Lê gundiyan jî, ji bavê wî re gotibûn ku, ger serê kurê xwe girê nede, memûrtiya wî zêde nadome! Ji bo vê bavê wî li cem rûniştibû û bi dilekî saf gotibû:

- “Kurê min, êdî dema zewaca te ye. Li ser kîjan axê, tu kîjan keçê dixwazî bêje. Ez bavê te me, cila bin xwe jî bifroşim, ezê bixwazim û bînim bixim paşla te!”

Lê wî bi xwe, ji mêj ve biryara xwe dabû û rêka xwe xêz kiribû. Ji xwe sond xwaribû ku derveyî evîna xwe, dil bernede ti keçên din; lê evîna xwe jî dabû oxira rêka şoreşê. Di dilê xwe de biryar dabû ku evîna xwe di dilê xwe de veşêre. Digot:

- “Bila ew jî birînek be û di kûrahiya dilê min de bimîne. Ger rojekê me welatê xwe rizgar kir, wê demê em dikarin werin cem hev.”

Lê baş dizanîbû ku nagihê salek, du salan wê evîna wî bizewciya û tev li mal û zarokan bibaya. Lê şoreş ne hêsan bû û temenek jê re dixwest. Wiha hişê xwe dibir dûr û digot:

- “Şoreşa Vietnamê di bîst salan de bi ser ketiye, bila ya me pênc salan zêdetir be. Dike bîst û pênc. Ev pênc sal derbas bûn, dimîne bîst. Ger em xwe sist nekin, hîn em negihîştine salên du hezaran emê di Kurdistaneke serbixwe û azad de, dawetan li dar bixin.”

Wê çaxê diçû nava xeyalan û roja rizgarbûna Kurdistanê dianî ber çavên xwe. Bi sedan keç û xort ên ciwan dîlan digirtin, govend digerandin. Lê ew êdî ji van tiştan pir dûr bû; ji hevalên xwe re digot:

- “Ji xwe hîn tirba me nîvçe maye; heta em Başûr û Rojhilat jî bi ser Bakur venekin, em di gorê de rehet nakin” û çeka xwe hildigirt, berê xwe dida Başûrê Kurdistanê...

Dîsa kevirek gindirî. Lê vê carê sedî sed hirçek çerixîbû ku berê digindirî zêde deng derdixist. Dawî ber hat û di ser zînarekê re, bi gurmîniyekê ket ser tehtan û belav bû. Li saeta xwe nêrî. Deh û bîst! Tam dema hatina hevalên wî bû. Dibe ku ev hirç ji ber wana reviya bû; ji ber vê li ber lingê xwe nenêrîbû û kevir ji ber gindirîbû. Awirên xwe hilgaftin jorê. Ezman dîsa têr sitêrk bû. Gelo kîjan sitêrk bû ew a bi tena xwe dîtîbû? Niha derûdora wê tije stêrk bibûn, hemû jî dişibiyar hevûdu. Ji cihê lê dinêrî stêrkek pengizî û bi milê Cûdî ve herikî û ket! Gelo ew bû? Qet ne baş bû; ji ber ku ew stêrk, wekî stêrka xwe hilbijartîbû. Ji xwe re got:

- “Ger ew ba ya, niha divîbû ez jî biherikîma wê dinyê!”

Kêmekî hizirî û dîsa axift:

- “Ti ferqiya vê dinyê û wê dinyê nîne. Ger mirov di vî halî de be, her du dinya jî wekî hev in. Dema mirov negihêjê armancên xwe çi ferq dike, ha ev dinya, ha ew dinya?! Ka hezkirinên me, ka heviyên me,

ka xeyalên me?... Her tişt derew e. Va ye ez dimrim û yekî jî nabînim. Rast e destpêkê jî me digot, ‘Dibe ku em nebînin, lê wê zarokên me bibînin’. Baş e lê kanî zarokên me? Kî li pey me tê? Wê kî bibe serî? Ma tu dizanî çiqasî jirêderketin çêbûye? Ez, pêwîst e yek bi yek binirxînim: rewşa şer, rewşa hevalan, rewşa dijmin... Ne hêsan e. Divê serok bizanibe.”

Êdî xewa wî nedihat û çav û guhên wî her li berpâlên binya Dola Şumûniyê bûn ku dengê lingê gerîlan were wî. Lê saet derbas bûn, şev qediya, berbanga sibê serî nîşan da, ji hevalên wî ti pêjin nehat. Êdî hêviya xwe bi tevahî qut kir. Ev du şev bûn ku nedihatîn. Ev ne helwesteke asayî bû. Êdî divîbû bi xwe li çareya serê xwe binêre. Niha bi dilekî rehet dikarîbû li ser rapora xwe ya dawî bihizire û sibê jî destpê bike...

\*\*\*

## ÇARDEH

Sibehê dereng jî xewê rabû, rojeke germ tîrêjên zêrînî dabûn ser lat û zinarên Girê Stûnê Çevir. Jora gir wekî binê tasekê wiha rût diterisand, lê her ku bi jêr ve dihat, dibû lat û zinar û dolik jê diçûn. Cawbarank û kefî ji ser xwe da aliyekî û rahişt lingê xwe yê birîndar, kişand ber xwe, danî. Yan ji sermayê, yan jî ji nelivandinê, lingê wî giran bibû û tevizî bû. Tirsê wî ew bû ku xwîn lê negere û xerab bibe. Ji vê tirsê, dema nû birîndar bibû lingê xwe pêçabû jî, lê di ser birînê re girênedabû ku xwîn raweste. Gelek caran bihîstibû û bi xwe jî dizanîbû ku xwîn neçe ser birînê, goşt dirize û lareş (kangren) dibe. Bi vê tirsê rehnê xwe ji her du milan ve bi jêrê ve firkand ta ku tevizandina wê jê çû û germ bû. Pişt re lingê xwe yê saxlem jî kişand ber xwe û bi firkandinê germ kir. Stûyê xwe zîvirand çep û rastê,

serê xwe bi jêr û jor de bir û her du destên xwe danîn ser her du milên xwe û bi enîşkên xwe cerge (daîre) ji hundir ber bi der ve ve û pişt re ji der ve ber bi hundir ve çêkirin.

Dawî her du destên xwe li pišta stûyê xwe gihandin hev û laşê xwe ji navqê û jor ve bir milê rastê û çepê. Lê tam di vê bêhnê de, laşê wî hat valatîyê û kaba wî jî pê re hejiya. Bi hejandina kabê re serê hestiyê şikestî di goşt re rabû û janê da ser kezeba wî. Çavên wî çilmisîn û rûyê wî qermiçî. Di cih de her du destên xwe avêtin lingê xwe û pê girt. Pişt re hêdî hêdî firkand ku jana wê jê biçe. Lê heta demeke dirêj jî, janeke zirav ji ser kezeba wî daneket û her dilê wî givaşt.

Careke din têgihîşt ku bi vî halî nikare bi ti deran ve gavekê biavêje. Ger hevalên wî bihatana jî bi vê rewşê ne dikarîbûn rahejinê, ne jî bi awayekî din bibin. Ger li darbestê siwar bikrana jî dîsa nedibû çare; ji ber ku heta di van kiryan re (kaşan re) hilkişiyabana, wê sedanê caran bihejiya û her hejandinê, wê xencer di dilê wî re rakiribana û wê qêrîna wî biça ezmanan. Rêka tê re biçûna jî ne wiha hêsan û kin bû. Destpêkê ji vî milê binya Kêlê wê biçûna navserê û biqulîpîna wî milê din ê binya Kêlê û ji wê şûn re jî, divê sê gir derbas bikrana. Girê Rijdê, wê li dorê bizîviriyana; Serkê Diryan, wê di neqebê re (astengê re) biqulipiyana û Serkê Mihemedê Oso, wê di her du astengên wê re daketibana û ji wir şûn re, xwedê dizane çiqase rê meşiyabana. Her du hevalên wî yê hatibûn cem, digotin ku, nexweşxaneyê biryargehê ji binê Pîro bar kiriye û bi ber Bestan ve hatiye. Ev saloxeke baş bû û sêdî sed nêzîktirê wî bibû. Lê çiqasî nêzîk bibaya jî, Kêlê ya digihiya ezmanan û du, yan sê gir li pêşiya wî bûn. Ger çiqasî bi lez û rehet biçûna jî, dîsa rêka du-sê şevan bû, yan jî şevêk û du-sê rojan bû. Ger hêstir



hebaya dibe ku zûtir biçûna. Lê li ser hêstirê jî mirovê saxlem ji hevûdu diket, ê birîndar wê çî bikraya.

Rewşa birîndarên li ser hêstirê diçûn, dihat bîra wî û bêtir dilê wî dihat givaştin. Qêrînên didan, niha jî li ber guhê wî bûn. Her ku hêstirê gava xwe diavet, laşê yê birîndar diçelqiya û hestî di goşt re radibû, qêrîn bi yê birîndar diket. Dikir hawar ku hêstirê rawestînin û wî deynin erdê, lê kê guh lê dikir? Divîbû zû wî bigihînin nexweşxaneyê û ji bo ve jî hêstir bi leztir diajotin. Wê çaxê jî yê birîndar dest bi xeberan dikir û çî dihat ber devê wî, ji hevalên wî dibin re, digot. Lê hevalên wî, ev xeber tev ji mêj ve dabûn ber çav û ji ber vê yekê dikeniyên û ji xwe re nedikirin xem. Dizanîbûn ku hevalê wana ne ji dil van xeberan dide, ji jana birîna xwe dide.

Carekê hevalekî ji kamaxa xwe birîndar bibû li ser hêstireke kulek siwar kiribûn û hêstir her ku gava xwe diavêt ê birîndar dest bi xeberan dikir. Wê çaxê hatibû di hawara yê birîndar de û dilê wî bi halê wî şewitîbû. Yê birîndar dixwest ku ji hêstirê dakeve û digot:

- “Min bikujin, lê bi vî halî nebin,” û hevalên pê re jî digotin:

- “Tu xwe biçirî jî, divê em te bigihînin nexweşxanê, yan na tê li vir bê derman xerabtir bibî.”

Ji milekî ve her du alî jî di peyva xwe de rast bûn. Yê birîndar ger bi wî halî biçûya, di her gavavêtina hêstirê de, wê xencerek di kezeba wî re rabaya û ji sed mirinan xerabtir, bi serê wî hatibaya. Lê hevalên wî jî dixwestin bêhnek berya bêhnekê, wî bigihînin nexweşxaneyê ku birîna wî derman bikin û erka xwe bi cih bînin. Lê di vê gengeşiyê de kesî hiş ne dibir ku hêstira kulek û birîna kamaxê li hevûdu nakin. Ji xwe ti hêstirên din jî wê gavê tinebûn û pêwîst bûn wê bikar bînin. Dema ev rewş û gengeşe dîtibû hatibû cem wan û di cih de hişê xwe dabû bikaranîn. Tişta got him ji aliyê yê birîndar,

him jî ji aliyê hevalên wî ve hat pejirandin û pêkanîn. Yê birîndar ji ser hêstirê vekirin. Du sê betanî li ser kurtan pêçan û birîndar bi devdevkî li ser piştê hêstirê dirêj kirin. Dema hêstir bi rê ket, ê birîndar hîn diqêriya lê vê carê xeber nedidan û digot:

- “Min jî dixwest ez bêjim ku ez li ser kamaxê nikarim biçim. Ma kî kê guhdar dike? Her yek, li ser serê me bûye qomitanek û dixwaze bela me ji xwe veke. Dibejê ‘ez vî zû bigihînim nexweşxanê, bi rê de diêşe, dimre, diçire qet ne xem e.’ Ma ne rojekê hûnê jî birîndar bibin? Ne hêstira kulek; heqê we, mirov wê li hêstira zîtok siwar bike, ku her zîtik avetin, êşa min bê bîra we û hûn careke din, bi serê ti hevalî wiha nekin!”

Wê çaxê hevalên wî yên li pey pê şa dibûn û digotin:

- “Me ti kesê birîndar wekî te gazindok û mizmizokî nedîtiye. Em birîndar bibin jî, wekî te nadin ber qîran. Êşiya bila biêşe. Xwezî niha ‘bayan’ li gel me hebana û me bidîta ka te qîr dida yan na!”

Henek, devavêtin, giftûgo û gengeşiyên wan wiha heta ku ji ber çavan winda dibûn jî berdawam dikirin. Gerîla ji van tiştan re ne xerîb bû, lê bi rastî jî tiştê ji birina birîndarekî zahmetir tinebû. Nexwasim ku ev birîndar hestiyê wî şikestî be, hîn zahmetir bû. Te çi lê bikraya, dîsa hestî cih didît ku di goşt re rabe û xwedyê xwe bide ber qîrdayînan.

Êdî sedî sed divîbû li ser çareyekê bifikiriya. Dibe ku heval bê darbest hatibana û bixwestana wî bi piştê bibrana. Wê demê sedî sed nikarîbû biçûya. Ger bi darbest bihatana jî, di vî kaşî re sedî sed wê bişemitîna û dîsa wê biêşiya. Divîbû rêka nehejandinê bidîta. Yan jî çareyeke wiha bidîta ku çiqasî hejiyaba jî, goşt û hestî hevûdu neêşandibana. Lê çawa dikarîbû ev yek pêk anîbaya? Divîbû li ser bifikiriya û rêyek bidîtaya. Ne ji bo hatina hevalan be jî, ji bo çûna

xwe jî, divîbû bifikiriya. Ger heval di hawara wî de nehatibana, dawî divîbû ew bi xwe rabaya û bi zikişkê be jî, biketa ser rêkê. Ji xwe re got:

- “Ger mirinek hebe jî, bila li ser rêkê be; ne di cih de rûniştî be!”  
Lê ev hêvî û daxwaza wî bû. Ne darek hebû pala xwe bidaya ser an bi dest bigirta, ne jî heywanek hebû lê siwar bibaya. Mirov bi lingekî dikarîbû heta ku derê biçûya? Dema zarok bû, bi lîska xêzk û ber a bi lingekî dileyist û ji wir dizanîbû ku piştî çend gavan, divîbû lingê xwe yê li jorê danîba erdê. Li ser yek lingî mirov zû diqerimî û diwestiya. Lê vê carê wê nikaribaya lingê xwe danîba erdê. Dema li ser lingekî xwe biqevizanda yan hilavêta sedî sed wê hemû laşê wî û ji xwe lingê birîndar bihejiya û hestî bileqiya. Xuya bû ku pêkanîna vê hêvî û daxwazê jî, ne hêsan bû. Yeke din jî ka ew hîlet (derman) pê re ku li ser vî zikê birçî û laşê jihalketî bi saetan li ser lingekî xwe hilavêje?! Ya baş ew bû ku hêviya xwe ji hatina hevalên xwe qut nekiriba û di cihê xwe de rûniştibaya. Ger heval nehatibana jî, helbet rojekê wê rêka hinekan bi Kaniya Mexelokê Reşik biketa û li jora kaniyê li komeke hestî rast bihatana. Bi vê sedemê, wê mereq kiribana û hestî vepexirandibana. Ji bo wê, divîbû rapora xwe binivîsanda û danîba ber serê xwe ku yê hestiyan vepexirîne vê raporê bibîne û bizanibe bê kî, çawa ketiye vî halî.

Êdî ti şik û guman di dilê wî de nema. Niha ji her tiştî grîngtir nivîsandina raporê li pêşiya wî bû. Divîbû ev raporeke wiha ba ku kin ba, cewherî ba û her tiştê di dilê wî de anîba ser ziman. Yanê wekî meseleya ‘Hûr biajo, kûr biajo û ga neêşîne’ baya. Rexneyên xwe jî bikrana, lê rexneyên xwe bidana jî.

Rahişt pênûs û kaxezê û dest pê kir:

- “Ji Serokatiya Partiyê re...”

Bê hemdê wî nivîsandina wî bi tîpên Kurdî rêz bibû. Lê di fermiyetê de, bibû kevneşopiyek ku raporên bi Tirkî binivîsînin. Heta niha hemû raporên xwe bi Tirkî nivîsîbûn. Lê vê carê çawa çêbibû ku destê wî çûbû ser tîpên Kurdî. Gelo bi Kurdî difikirî ji bo wê bû, yan jî wiha sirûşek (îlhamek) bû, hatibûyê? Gelo bi Kurdî nivîsandiba baş bû, yan bi Tirkî? Demeke dirêj li ser vê dudilîyê fikirî û negihîşt ti biryarê. Dilekî wî digot:

- “Serok bi Kurdî dizane. Tu bi Kurdî jî binivîsî, Tirkî jî binivîsî ferq nake.”

Lê dilê din digot:

- “Çawa ferq nake. Her kes baş bi kurdî nizane û ji ber vê yekê têgihîştina wana ji hemû peyvan re çênabe; dibe ku bi vê sedemê rapor negihêje armanca xwe. Ya baş bi Tirkî binivîsîne ku herkes jê fêhm bike.”

Dilê wî yê din, wê çaxê diket parastinê û digot:

- “Qe ne bila rapora dawî bi Kurdî be, ne hat fêmkirin jî bila neyê fêmkirin. Lazim yekî jê fêhm bike wê hebe. Te bi Kurdî destpê kiriye, bi Kurdî bidomîne.”

Dawî ji dudilîbûna xwe westiya û pênuş û kaxez danî aliyekî ku heta di biryara xwe de zelal bibe, pişt re binivîsîne.

Roj qederekê bilind bibû û îroj ji her rojê germtir bû. Destê xwe avêt kevçî û berf kola. Dema gihişt berfa nerm kevçiyê xwe dagirt û bir ser zimanê xwe. Ev ne taştê bû, ne firavîn bû; di navbera her duyan de bes ji bo ziktêrkirinê bû. Zik jî êdî wiha lê hatibû ku bi rastî jî dihat xapandin. Dema kevçî diçû hundirê dev û cemidahiya hesin diket ser zimanê wî, zikê wî digot qey ew kevçî tije ‘keliz’ e û bi vê hestê zû têr dibû. Bi vî awahî zora hesta têrbûnê dibir, lê nikarîbû zora rastiya hilandinê bibraya. Roj bi roj laşê wî dihiliya û ji hîlet diket.

Bêhîletî jî bêtir ji sistbûn û nesaxketina laş re rêk vedikir. Lê baş bû ku heta niha ti nexweşî lê peyde nebibûn.

Heta nîvro xwe wiha bi xwarina berfê û ramandina li ser tiştên beradayî mijûl kir. Wê behnê li gorî wî divîbû rapora xwe binivîsanda û bi vê sedemê, her tiştên derveyî vê wekî karên beradayî dinirxand. Ramana wî pir zû belav dibû û diçû her derê; her tişt dihat bîra wî. Ji bo tiştêkî tewra sivik jî nikarîbû biryareke sedî sed bidaya. Dudiliya wî û tevliheviya ramana wî, gelo ji ku derê dihat? A baş kêmekî nivistin bû. Ger nîvsaetekê xew bikraya, dibe ku mejiyê wî hinekî rawestiyaba û dema hişyar biba, wê bêtir bikarîba biryarên di cih de bidana.

Ev baş bû, lê biryarên di cih de çawa bûn û yê ne di cih de çawa bûn? Wê ew her du çawa ji hev naskiribana? Vê bêhnê biryara digot, 'Di cih de ye', bêhneke din dibû biryara 'Ne di cih de'. Dîsa biryara li gorî dilekî wî di cih de dihat dîtin, dilê wî yê din qet di cih de nedidît. Ger wiha bidomiya, sedî sed wê hişê wî ji serê wî çûba û êdî wê goştê laşê xwe xwaribaya.

Gelo niha hişê wî çiqasî li serê wî bû, yan çiqasî ji serê wî çûbû? Gelo qetek ji goştê laşê xwe xwariba, wê çi bibaya? Di zaroktî de gelek çîrokên wiha ji dayika xwe bihîstibû. Dema mirov birçî diman, ji bo ku nemirin, goştê laşê xwe jêdikirin, dipijandin û dixwarin. Bes wî nikarîbû bipijanda, ji ber ku ne tayeke dar, qirşikek jî li derdore tinebû. Goştê xav jî qet ne xweş bû. Wekî din jî hîn ewqasî birçî nebibû ku goştê laşê xwe bixwara. Berfê niha birçîbûna wî ditemirand. Heta pêncî - şeş rojan jî birçî dikarîbû li ber xwe bidaya. Şehîdên Biryara Çardehê Tîrmehê, yê sala Heştê û Dudyar pêncî û heft rojan tiştêk nexwaribûn. Helbet heta pêncî û heft rojan hin kes

bi ser de dihatin! Ger heta wê demê kes nehatiba, wê çaxê dikarîbû goştê laşê xwe bixwara!

Hişê xwe komî serê xwe kir û bi halê xwe keniya. Ji xwe re got:

- "Ji xwe ev ji te kêm e; hişê xwe jî bixwe ku tu tam ji dest biçî."

Bi rastî şaş mabû ku çî bihizire. Wekî di binê bîreke pir kûr de be; ne bikaribe jê derkeve û ne jî dengê xwe bibe ti kesî; wiha xwe bêçare didît. Rastiya rewşa wî wiha bû. Lê nedixwest hêviya xwe jî qut bike. Mirovên bê çare herdem ji xwe re hêvî diafirandin ku bikaribin xwe bigihînin rêka çareseriyê. Ger hêviya wan vemiriyaba, wê demê ji bo derbaskirina rewşa xwe hewl nedidan û wê di wê rewşa bêçare de ji dest çûbana. Ew jî niha di rewşeke wiha de bû. Ji xwe re got:

- "Bêhêvîbûn mirin bi xwe ye! Ger hêviya te biçe, tu ji bo çî jiyana dikî? Ma kes dikare bê hêvî jiyana bike? Divê hêvî herdem hebe!"

- "Dikare helbet!"

Dîsa dilê wî yê din dest bi axaftinê kiribû û li hemberî wî derdiket. 'Hin mirov hene, qet nizanin hêvî çî ye? Ji ber ku hêvî ne karê wan e. Ew her tiştê xwe di demê de çareser dikin. Ne hewceyê hêviyê ne."

- "Em çawa bikin? Em bêçare ne; mirovê bêçare jî, divê ji xwe re hêviyê çêbike!"

- "Rast e, hêvî xwarina neçaran e. Kesên bêçare hêviyê çêdikin û xwe pê ve girêdidin. Lê kesên xwediyê çareseriyê, çima xwe bi hêviyê ve girêbidin? Heta ku li ser hêviyê dema xwe biborînin, wê çareser bikin û gaveke din biavêjin."

- "Em ji vê yekê dûr in."

- "Ji bo wê hêvî nan û avê feqîran e!"

- "Û yê bindestan."

- “Wek hev e. Yek ji yekê dertê. Ger em ne bindestbana, em feqîr jî nedibûn.”

- “Wê çaxê emê jî ji xwe re zêde zêde hêviyê çêbikin. Heta ne hêviyekê, emê bi sedan hêviyan çêbikin ku em bi tevahî xwe ji dest bernedin.”

- “Şûna tu hêviyê çêbikî, çareseriyê pêk bîne. Xwe bi ser xîne. Hêvî zikê te têr nake. Ew xeyal e, ne li ber çav e.”

- “Rast e, lê heta mirov pêwîstiya nan nebihîse, mirov ji bo ghiştina nan hewil jî nade. Yanê ger mirov ji ghiştina nan bêhêvî be, mirov qet zad naçîne û erde cot nake.”

- “Niha ne dema van tiştan e. Ka tê çawa rapora xwe binivîsînî, li ser wê bihizire. Rapor ji hemûyan grîngtir e.”

- “Ew jî hêviyek e!”

- “Rast e, û ji neçarî ye. Ger niha derfeta te hebaya ku tu raba ser xwe û biçûya cem hevalan, ma te rapor dinivîsand? Na! Ger tu hewceyê nivîsandinêyî, ji sedema neçariyê ye û dema tû dinivîsînî, ew dibe hêviyek ji bo rojên pêş ku...”

- “Temam, tamam, mijara hêviyê bes e. Ya rebî ya îlahî îro çi bi hişê min hatiye? Hema diçelqe û vir de wir de diçe. Çiqasî dikare li ser tiştên talî biweste. Hîn xetek ji raporê nefikiriye, li ser hezar tiştên talî bi saetan dihizire. Balkêş e! Gelo ez hişê xwe dixwim? Çi bi serê min tê? Ya star!”

Destê xwe dirêjî kevçî kir ku hinek berf bixwe û ramana wî biçê ser tiştên din. Du kevçî tijê berf mijt şûn re, bi rastî jî hinekî hişê wî hatibû serê wî. Li ezmên nêrî; dîsa pêlên ewran yek pey yek dest bi herikandinê kiribûn. Lê wekî roja destpêkê ne bi lez û bez bûn. Niha girantir diherikîn. Cih bi cih şînatîya ezmên zêdeyê ewran dibû, cih bi cih jî ewr zêdetirê şînatîyê dibûn. Lê ji ber ku ewr diherikîn, ew

rewş, serê her bêhnê dihat guhertin û ne diyar bû ku wê kîjan bi ser kîjanê bikeve.

Tenê dizanîbû, wê baranek bibare. Dûr-nêzîk di van çend rojan de wê ewrên komî ser hev dibin, xwe bigivaştana. Ji bo wê, ji xwe re, vala vala hêvî çênedikir ku bêje, 'bila baran neyê' û dizanîbû barana were wê wî perîşan bike, ji hal de bixe. Ji xwe bi şevê ji sermayê gelek caran dibû şerqe şerqa diranên wî. Ger baran jî bi ser de hatiba, êdî wê sermayê xwe diwartir kiriba û dibe ku zatûre jî bibaya. Divîbû heta jê hatiba xwe ji baranê biparasta. Lê ne rojek û ne şevê bû ku xwe biparêze! Dibe ku baran hefteyekê bidomiya. Dibe ku lehî bihata bin wî. Dibe ku baranê di cawbarankê re daba der. Divîbû ev tev daba ber çavên xwe û...

- "Dîsa hişê min çû ser tiştên beradayî. Êdî ka bila baran bibare, xwedê mezin e. Ka li ser raporê bifikire. Hinekî jî hişê xwe bibe ser raporê. Tu li ser tevahiya tiştan dihizirî, lê li ser karê grîng narawestî, wekî çepgirên Tirkan li te hatiye!"

- "Ger tu raporê binivîsinî jî divê tu bixî hundirê naylonekê û baş bant bikî ku şil nebe."

- "Li hişê te be! Te rapor qedandiye, maye parastina wê!?"

Êdî bi xwe re heyirî mabû. Dikir û ne dikir, nikarîbû hişê xwe, li ser raporê, kom bikraya. Tam di wê bêhnê de, lebitînek di birîna xwe de bihîst û veciniqî. Bi ve veciniqînê wekî yek nava mejiyê wî bixurîne, wiha aciz bû û hemû ramanên di hişê wî de, ji serê wî çûn. Di cih de piştî xwe ji tehtê kişand û bi her du destan rahişt lingê xwe yê birîndar û kişand ber xwe. Ji xwe kêmeke din wê tav bihata ser laşê wî; tam dema vekirina birînê bû. Xuya ye hîn kurm di birînê de mabûn û divîbû bi tevahî werin paqijkirin. Êdî kurm mezintir dibûn û jana didan jî diwartir dibû. Ecêb e ji sibehê ve neliviyabûn.



An ji germê re liviyan an jî ji xew hişyar bûn. Gelo kurman jî xew dikirin?

Dest avêt şûtikê û bi lez li dora lingê xwe fitiland û vekir. Dema hat pêçana binî, bi kotekî ji ser birînê vekir, ji ber ku bi kêleka birînê ve hişk bibû. Lê beşê dihat ser nîveka birînê, ji nême şil bibû û şilbûnê xwe dabû hemû tewên pêçanên dihatin ser wê derê.

Dît ku li ber kuna birînê du kurmên spî serê xwe vir de wir de dibin û li cihekî xwe veşêrin digerin. Bi mûçingê her du kurm, yek pey yek girtin û bi ber ve perçiqandin. Çiqasî çavê xwe gerand, ti kurmên din nedîtin û bi livandina wan jî nehisiya. Di dilê xwe de ghişt wê qinyatê ku koka kurman qelandiye! Dawî li ber xwe dabû û bi ser ketibû. Hêviya xwe ji vê serkeftinê qut nekiribû. Dema kurm ketibûn birîna wî ger hêviya xwe qut kiriba û gotiba; 'Çû', bi rastî wê ji dest çûba. Lê wiha nekiribû. Hêvîdar bû ku wê yek bi yek wana bigre û nehêle mejiyê wî bileqînin. Dawiyê ew bi ser ketibû û hêviya wî, bibû serkeftin.

Ji serê şûtika paqij û ziwa, çend qetên biçûk jêkirin û dest bi paqijkirina birîne kir. Nêma zer tev ziwa kir. Dîsa ji nêzîk ve li birînê nêrî û ti kurm li derdorê nedîtin. Qetek şûtika paqij danî ser birînê û dest bi pêçanê kir...

Tava ghiştîye ser laşê wî, hinekî ew sist kiribû. Ji ber vê, çavên wî diçûn ser hev. Ji xwe piştî paqijkirina birîna xwe, êdî karekî bike nemabû. Ji bo nivîsandina raporê jî, niha xwe amade nedidît. Dizanîbû ku carekê dest pê bike, wê heta dawî biçê. Ji bo vê nivîsandin ji xwe re ne kir xem û çavên xwe birin ser hevûdu. Mijankên wî wekî çola bi hesreta avê, hevûdu himbêz kirin û dest ji hev bernedan. Êşeke zêde ne dijwar da ser laşê wî, lê têrê nekir ku wî ji xew veciniqîne...

Di xewa xwe de li cihekî hişîn û têr av bû. Di her milî re kanî diherikîn û dihatin li binê lingên wî digihiştin hev, dibûn robareke tenik û sernişûv diçû. Destên xwe dikir çeng û dirêjî binê avê dikir. Av di cih de dibû krîstalên tîtikî û çenga wî tije dikirin. Lê çiqasî dihatin, di ser re nediqulipîn û her di çenga wî de dibûn parçeyên hûr ên tîtikê û komî ser hev dibûn. Dema destê xwe ji bin kaniyê dikişand, av dîsa dibû av û diherikî. Çenga xwe vekir û parçeyên tîtikê herikîn erdê, tev li avê bûn û çûn. Dîsa destê xwe da ber avê û dîsa bû tîtik. Dîsa vekişand, dîsa bû av.

Di wê bêhnê re teyrek hat ser avê, li ser tehta li kêleka kaniyê danî û nikila xwe xist nava avê. Nikila wî/wê di nava avê de ma û av qerisî bû tîtik. Teyr çiqasî da xwe, baskên xwe li hev dan nikarîbû xwe bifilitîne. Her du lingên wî/wê jî gihîştibûn cihê şil û bi çariyeke tenik ji tîtikê hatibûn girtin. Piştî demekê ku baskên xwe li hev dan, westiya û ji hal de ket. Di wê bêhnê re teyreke din hat ser kaniyeke din û ew jî bi avê ve zeliqî ma. Wî/wê jî çiqasî li ber xwe da nekarîbû bifitile û dawî bê hal ket. Piştî ku ew jî bê hal ket, refeke teyr hatin û her yekî/ê li ser kaniyekê danîn. Kanî tev qerisîn û bûn tîtik. Lê çem hîn diherikî.

Ewqasî têhnî bû ku xwe devdevkî avêt erdê û devê xwe xist ava çem jê vexwar. Av nebû tîtik û neçikiya. Gelo çima nebibû tîtik? Qet wate nedaye. Ji wir meşiya û çû nava darên fêkiyan. Darên hejîran, ên mişmişan, ên hirmiyên li kêleka hev rêz dibûn û li jora wan jî mîwên trî diyar dikirin. Çû ber dara hejîrê û destê xwe avêt libek pexoxî ku jêbike û biavêje devê xwe. Lê çawa ku destê wî gihîşt liba hejîrê, hejir ket erdê û wekî tîtika li ser kevir bikeve, şikiya û hûr û mûr bû, li wê erdê belav bû. Çû ber dara hinarê, hinar jî wiha lê hat. Çû ber dara hirmiyê, hirmî jî wiha lê hat. Êdî him aciz bibû û him jî ji birçiyên

re nava wî dişewitî. Li nava rez, çavên wî li kolikekê ket. Meşiya bin kolikê û xwe avêt erdê. Her du milên wî tije mêw û mêw jî tije goşiyên tirî bûn; lê nediwêrî dest biavêjîyê ku ew jî nebin tîtik. Goşiyek raserê serê wî bû. Awirên xwe bi jor ve birin û goşî dît. Serê xwe bi paş de bir û kêmekî bilind kir, lêvên wî ghiştin goşî. Ecêb bû goşî nebû tîtik! Wiha lib bi lib goşî tev xwar û ji ber ku goşî mezin bû jê têr xwar.

Dema rabû ser xwe destê wî li goşiyekî li kêleka wî ket û goşî ket erdê hûr û mûr bû, belav bû. Êdî têgihîşt ku destê wî digihêje çî, dibe tîtik û divê tenê bi devê xwe jîyan bike. Dîsa vegeriya ser kaniyan û çiwîkên bûne cam yek bi yek, bi devê xwe girtin, ji nava lehiya tîtikê vekişandin û hilavêtin jorê. Çiwîk zindî bûn û firîyan; kanî jî ji nû ve herikîn. Bi devê xwe têr av vexwar û ji wê derê xwe dûr xist. Nizanîbû bi ku derê ve dimeşe; lê texmîn dikir, ber bi gundekî ve dimeşiya; ji ber ku ji dûr ve hin ronahiyên zêde ne birîqandî diyar dikirin. Di wê bêhnê re wekî ku erd li ber lingên wî biqelêşe û bikeve hundirê wê; bi carekê re çalek derket pêşîye û çawa gava xwe avêt, di çalê werbû û ber bi binê çalê ve firîya...

Ji xew veciniqî û rabû ser xwe. Lingê wî yê birîndar dîsa tevîzî bû û pûç bibû. Bi her du destan firikand heta ku xwîn lê geriya. Rahîşt lingê xwe û dirêj kir. Kefî û cawbarank dîsa avêt ser û pala xwe da tehtê. Êdî rojê hêdî bi hêdî tîrêjên xwe ji Gelî vedikşandin. Êdî nema dikarîbû rapor jî binivîsanda. Ya ku îşev tişteke bi serê wî hatiba û bê rapor ji vê dinyê biçûya! Wê demê wê ti caran kesî nizaniba jiyana xwe çawa ji dest daye. Roja xwe vala vala derbas kiribû. Ger hinekî zor bidaya xwe dikarîbû binivîsanda. Lê ji bêxemî nenivîsandibû. Sibê qiyamet jî rabaya, divîbû binivîsanda!

Gelo îşev heval nedihatin? Pirahiya hêviya xwe qut kiribû; lê dîsa jî dilê wî bi was was bû. Dikir û nedikir nikarîbû bi tevahî hêviya xwe ji hatina hevalên xwe qut bikraya. Lê êdî dizanîbû ku zêde ji wana bihêvîbûn jî ne rast bû. Ji xwe re got:

- “Xwedê çi nivîsîbe wê ew bibe!” Lê pey re hizirî ku xwedê heye yan nîne. Lê bi vê ramanê re tirsek ket dilê wî û got:

- “Ger hebe!?”

- “Hebe jî, nebe jî ma qey ti karê wî tine, bi min dakeve?”

Wiha hizirî ku dîsa hişê xwe bi tiştên vala mijûl dike û dîsa wê ti çareseriyê bi xwe re neyne. Baş bû ku di wê bêhnê re, bayek liviya û dengê jeneratora dijmin anî ber guhê wî. Her du destên xwe dan erdê û laşê xwe bilind kir. Serê wî bi ser keviya berfê ket. Lempeyên li derdora kozikên girê dijmin li ser e, pêketibûn û di bin siya lempeyan de kevirên kozikên dijmin diyar dikirin. Destên xwe sist kirin û li cihê xwe rûnişt. Êdî êvareke din û şeveke din destpê dikir. Hîn ku hewa tam sar nebibû, dema xwarinê bû. Ger sar biba, nikarîbû têr bixwara...

\*\*\*

## PAZDEH

Stêrka ji bo xwe hilbijartibû, dîsa berya tevan biriqand. Stêrka wî hîn xurt bû û li ser xwe bû; ji ber wê ronahiya wê jî zêdetir bû. Pişt re çend stêrkên din diyar kirin; lê ewqasî nedibiriqandin. Dema reşahî bi tevahî ket ser Gelî, êdî stêrk ewqasî pirr bûn ku ya xwe di nava wana de winda kir û awirên xwe ji ezmên daxistin berpala çiyê. Berpal di binê tava heyvê de diterisand, lê derveyî terisandinê tişteke din diyar nedikir.

Li saeta xwe nêrî, nêzîkî nehê şevê dibû. Bayekî sivik di ber guhê wî re reqisî û bi jêra Gelî ve herikî. Ji xwe re got:

- “Xwezî niha cixareyek hebaya ku bi vî bayê zozanan re min rêkiriba kûrahiya kezeba xwe.”

Qefil bi qefil pakêtên cixareyan û her cureyên tûtînê hatin bar çavên wî. Tûtina zer; wekî porê keçên ciwan, zirav û zêrînî dibiriqand. Tûtina sor; wekî porê hinekirî li kêlekê bû. Lê dilê wî dibijiya tûtina Ewrex. Berê bavê wî bahsa tûtina Xursê dikir. Wê demê hîn zarok bû cixare nedikişand. Lê bavê wî pir dikişand. Her dem qala tûtina Xursê û tûtina rîşî ya wekî porê qîzikan dikir. Lê ti caran jî tûtineke wiha nedianî malê. Herdem ew tûtina ku digot, ‘kamaş’ dianî. Li ser sifrê radixist. Qirşikên wê tev ji navê digirtin û çenga xwe tije av dikir, pê avreşandî dikir. Têdigihîşt ku derfeta bavê wî nagihêje tûtina rîşî yan jî ya Xursê bikire. Dihizirî ku li gorî ewqasî xweş e û qala wê dike, divê ewqasî ji buha be. Tişteki buha jî nîkarîbûn bikiriyana. Ev demek e ku bavê wî ji ser kar derxistibûn û di got:

- “Ez careke din li vê çiftlikê kar nakim.” Wî digot, “Ez bi xwe derketime.” Lê dayika wî jî digot:

- “Hingî serhişk e, ew ji kar derxistine.”

Êdi nizanîbû ji kê bawer bike. Tenê dizanîbû ku rewşa wan a aborî ne baş bû; her tiştê dilê wan bixwesta nîkarîbûn bikiriyana. Ji bo wê dizanîbû ku bavê wî nikare tûtina Xursê bikişîne!

Lê piştî çend salan, wî jî dest bi çixarê kiribû û di vê navberê re tûtina Xursê him jî ya rîşî dîtibû. Bi rastî jî li xweşiya wî çûbû û digot:

- “Divê keç hemû, porê wana, wiha be!” Li ber tavê wekî zêr diterisî û dema te radihişt piçekê, yê din gişt pê re dihatin. Ger mirov ne qalûnvexwarî ba jî, dilê mirov diçûyê û dixwest vexwe. Dema hilmek

jê dikişand şêrînahiyek diket devê mirov û dûmaneke gewr jê bilind dibû. Ger carekê pêbiketa, heta piça dawî êdî venedimirî.

Piştî tûtina Xursê, ji pirtûkan fêr bibû ku tûtina Heskîfê bi nav û deng e. Di şeş saliya cixarevexwarina xwe de, rêka wî bi bajarokê Heskîfê ketibû û xwestibû vê tûtina bi nav û deng bibîne. Lê xort û zilamên wê derê bi xwe cixareyên pakêtan dikişandin û gelean ji wana nizanîbûn ku tûtina axa wana ketiye pirtûkan.

Nebibû qismet ku tûtina Bedlîsê vexwe. Cixareyên pêçayî yên li ser navê Tûtina Bedlîsê derketibûn jî ne ti cixare bûn.

Dawî di bîst saliya cixarevexwarina xwe de li tûtina Ewrex rast hatibû. Wê demê li Bestan gerîla bû û şeveke bi baran û seqem bi rêketibû. Dîsa ji milekî ve bê qût bûn û ji milekî ve baranên payîzê destpê kiribûn.

Wê rojê komeke din a gerîlan berê xwe dabûn gundê Ewrex ku bikaribin hinek qût peyde bikin. Gundî cerdewan bûn, lê zêde dijayetiya gerîlan nedikirin; bes nedixwestin alîkariyê jî bikin. Ji bo vê kêmek erzaqê bêxêr dabûn gerîlan. Dema gerîlan ji malê derketibûn, li ber derî çavê yekî li kêsekî tûtinê ketibû. Ji xwe ev demek bû bê tûtin bûn. Hema rahiştibû kîsê tûtinê û avêtibû ser milê xwe. Xwediye malê çiqasî gotibû, 'Ew ne ji bo firotinê ye' jî; derxistibûn pereyê wî dabûnê û tûtin bi xwe re anîbûn. Di wê tinebûnê de torbeyek tije tûtin, wekî torbeyek tijê zêr bû.

Heta wê rojê hîn tûtina Ewrex nekişandibû. Ji rêyeke dûr dihatin û derdora nîvê şevê gihiştibûn cihê koma gerîlan a ji gund hatiye. Dîtibûn ku her kes çixarê dikişîne û kefxweş bibûn. Qutiyên wan ji dest wana girtibûn û her yekî cixareyek stûr pêçabûn. Dema cixare xistibû nava lêvên xwe û pêxistibû, bi hilma destpêkê re wekî şûşeyek tije ava lîmonê bi ser xwe dake, wiha hênkahiyeyeke mizî tirş

li ser zimanê xwe bihîstibû. Ev cara yekemîn bû ku ewqasî tameke xweş, di hundirê devê wî de kom dibû. Hîn çixara xwe bi dawî nekiribû, yeke din pêçabû û bi dûvikê ya yekemîn pêxistibû, li ser a destpêkê berdewam kiribû. Dawî fermanîdarê koma ji gund hatibû, bi destê xwe kîsik û qûtiyên tevan dagirtibû û her yekî qasî du qutiyên jî ji bo rojên pêş dabû wana. Ji kêfa tûtînê re, xwarin jibîr kiribûn û karê xwe yê xewê dikirin ku sifreyeke çay, nan û penerê sîrik hatibû ber wana. Êdî xewa kê dihat! Hemû westandina xwe jibîr kiribûn û dest avêtibûn xwarinê. Piştî xwarinê dîsa tûtina Ewrex stûr stûr pêçabûn û têr kişandibûn. Derengiya şevê jî êdî serê xwe danîbûn ser çenteyên xwe, kefî û cawbarankên xwe kişandibûn ser serê xwe û pix kiribûn xewê.

Belê, niha du sê cixareyên ji tûtina Ewrex hebana, qet wê ne xema wî baya. Zimanê xwe di devê xwe de gerand û mijt. Tama tûtina Ewrex hîn di binê zimanê wî de bû û careke din qinyat anîbû ku tûtina Ewrex ji ya Xursê xweştir bû...

Ji jorê kevirek gindirî. Ji xeyal û ramanên xwe veqetiya û bala xwe da ser cihê deng jê tê. Kevirê digindirî xuya bû di cihekî têr berhûrik re gêr dibû û mezin bû ku bi xwe re kevirên din jî digindirandin. Piştî bêhnekê wiha gindirîn şûn re, hatin û li çalekê, li ser hevûdu kom bûn û deng jê qut bû. Wekî gindirîna ber, daketina çalê, xirikandina keviran, wiha wate dida dengên dibihîst û dianî ber çavên xwe.

Bêhneke kin a din, dîsa li wî cihê û bi wî awahî berekî din gindirî û kêşiyek kevirên hûr û mûr bi xwe re anî û li çalê kom kirin. Pişt re deng qut bû û careke din, êdî kevir negindirîn.

Hişê xwe tev da ser ku têbigihêje dengê çî bû. Pîr hizirî û di encamê de gihişt wê qinyate ku ne hirç, ne rovî, ne jî mirov bûn. Ji ber ku hirç û rovî bi tena xwe digeriyan, lê ev, du deng li pey hev hatibûn.

Ger mirov bana divîbû dengê hatiye domdar ba. Wê demê yan pezê kovî bûn, an jî beraz bûn. Di navbera her duyan de hişê wî çû û hat. Dawî biryara xwe di aliyê berazan de da, ji ber ku pezkovî pir nazdar û baldar dimeşyan, zû bi zû kevir ji ber lingên wana nedigindirîn. Lê beraz giran û cangiran bûn. Tenê kevirê wiha mezin ku bikaribe berhûrikan bi xwe re bigindirîne, dikarîbû ji ber lingê berazan ji cihê xwe veqetiyaba! Û beraz jî derveyî yên yekane, tev kom bi kom digeriyan. Yek li pey yekê rêz dibûn û carcaran rêza wan a meşê ji ya gerîlan dirêjtir dibûn. Lê wana cixare nedikişandin û ji bo vê ti pirsgirêka wan a dîtina tûtînê tinebûn. Ji xwe qûtê wan berû bûn û li Bestan, li Botanê ji berûyan pirtir dîsa berû hebûn. Mixabin piştî valakirina gundan, êdî gund bibûn wargehên berazan. Gelek ji wana bi roj jî li gund diçêriyan û mexel dihatin. Êdî zêde qîma xwe bi berûyan jî nedianîn. Li binê darên fêkiyên cûr bi cûr diçêriyan, lê bêtir kêfa wana ji çêrandina nava rezan re dihat.

Li saeta xwe nêrî, saet deh û nivê şevê bû. Ji xwe re got:

- “Îşev jî çû. Ger hatineke hinekan hebaya, heta vê saetê wê bihatana. Heval sedî sed ne li van derdoran in. Kî dizane çi bi serê wan her du hevalan hatiye? Yan na ne mumkun bû ku hinek bi vir ve nehatibana. Lê ev dibe şeva sisyan. Niha li Şengalê bana gerek hatibana. Êdî bi rastî çû, nema tên. Ezê sibê dest bi raporê bikim û biqedînim. Pişt re lingê xwe girêbidim û bi çi awahî be bi ser rê kevim. Ez nikarim li vê derê li hêviya mirinê bimînim. Hîn ku bi tevahî laşê min nehiliye û ji hal neketiye, ez xwe bigihînim ser rê û rêbaran ku li hinekan rast bêm, an hinek li min rast werin. Kêm kêm divê ez xwe bigihînim Kavil...”

Dizanîbû ku Kavil li ser rêka gerîlan bû. Komên gerîla dema Kêlê qut dikirin di Kavil re derbas dibûn. Li navserê du kaviên bi nav û deng



hebûn. Yek Kaviî Kulekan, yek jî Kaviî Memê Şivan bû. Ji xwe navê Memê Şivan li Kêlê kiribûn û digotin Kêla Memê. Tirkan jî wekî hemû heyîneyên Kurdan çewt kiribûn û guhertibûn, navê Kêla Memê jî kiribûn 'Kel Memet'. Ev jî dihat wateya 'Memê Gurî.' Lê Memê Şivan qet ne gurî bû û xortekî çelengî mêrxas û spêhî bû. Ger sax ba û ev navê Tirkan lê kirine bihîstiba, wê kirasê xwe biçiranda, qiyamet rabikra û qet nedipejirand.

Çavên xwe birin ser hev û xwest hinekî xew bike. Giraniyek li ser laşê xwe dibihîst. Wekî ji tişteki aciz bibû lê nizanîbû çi ye, canê wî dihat givaştin û sebra wî nedihat. Bi carekê re çi lê hatibû? Hizirî, lê zêde serê xwe pê neêşand. Dizanîbû ku bêhnekê binive, wê her tiştî jibîr bike. Razan dermanê westandinê bû; çi ji aliyê mejî ve, çi jî aliyê laş ve. Gelek caran dema ji bûyerekê yan ji tişteki hêrs dibû, heta ku nîvsaetekê xew nekiriba, bêhna wî nedihat ber wî û fireh nedibû. Niha jî, giyana wî dihat givaştin û pêdiviya xwe bi xewkirinê didît. Çawa ket xew, çiqasî di xewê de ma, çawa hişyar bû, nizanîbû. Carekê çavên xwe vekirin ku heydedanek û gengeşiyek tije guhên wî bûye. Her yek ji aliyekî ve li ber guhê wî diaxivin. Her yek tişteki dibêjin û kes li kesî guhdar nake. Kes pê re jî naaxive û kes li wî jî guhdar nake. Çi diaxiftin, ew jî nedihat têgihîştin; tenê wekî kawara mêşa hingiv, xumînek ji derdorê dihat.

Li vi milî nêrî, kes nedît; li milê din nêrî kes nedît; li paş nêrî, dîsa kes nedît. Ji xwe heydedan û xumîni jî qut bibû. Nû têgihîşt ku xewn dîtiye. Di xewna wî de gelek mirov li derdora wî kom bibûn û di ber xwe de diaxiftin. Lê nedidît ku bizanibe heval in an hin kesên din in. Ji dengên wana jî nedihatîn naskirin; ji ber ku ne zelal bû û tiştên diaxiftin jî nedihat têgihîştin.

Guhê xwe da ser dengê xwezayê. Ti dengekî wiha balkêş nedihat. Gumîniyeke tenik û kûr a şevê ku herdem hebû didomiya lê derveyî wê hemû heyîneyên derdorê xwe bê deng kiribûn.

Li ezmên nêrî, nive nîv stêrkan cihê xwe dabûn ewrên gewr û bayekî nerme ew dabûn ber xwe, di ber stêrkan re diborandin. Ji xwe re got:

- “Ev çend roj in ev bayê hanê van ewrên reben dide pêşya xwe û dibe! Ger li ku derê wana komî ser hev bike, sedî sed wê lehî li wê derê rabe!”

Ji xwedirêjkirina li ser milekî, laşê wî qerimîbû. Ev çend roj bûn, jê re bibû hesret ku xwe biqulipîne ser aliyê xwe yê birîndar û wiha xew bike. Her ku giraniya xwe dida ser aliyê birînê, hestî û goşt li hev diketin û janê diavêt ser dilê wî. Wê demê jî, dîsa giranî dida ser aliyê xwe yê saxlem. Lê piştî bêhnekê şûn re, aliyê saxlem êdî ditevîzî û pûç dibû. Hesteke rizîbûne dihat ber dilê wî û can diavêt ku xwe biqulipîne milê din. Lê bi dest wî nediket.

Vê carê jî wiha bû. Lingê xwe yê birîndar li erdê rast kir û kamaxa xwe ji erdê kêmekî bilind kir ku laşê xwe biqulipîne ser teniştaya xwe ya aliyê birîndar. Bi qulipandina laş re, lingê wî yê saxlem pê re rabû û serê lingê wî ket ser birînê. Hestî û goşt bi ser hev ve hatin givaştin û dilê wî xav bû, cîhan lê tarî bû û li dorê zîvirî. Di cih de çavên xwe girtin û diranên xwe givaştin. Ger ji zilamtiya xwe şerm nekiriba, ji dijiwariya êşê dikarîbû bigiriya jî. Lê hat bîra wî ku ev çend sal bûn, dilopek tenê jî rondik ji çavên wî nebariyabûn û xwedêgiravî kaniyên çavên wî ziwa bibûn. Bi zarokî ewqasî giryabû ku av di çavên xwe de nehiştibû. Careke din laşê xwe vegerand rewşa berê û qîma xwe bi tevîzîna kamaxa xwe ya milê saxlem anî. Hesreta xwe ya nivistina li ser milê birîndar, dîsa nikarîbû biborîne û pê re mabû.

Li saeta xwe nêrî. Êdî dema vegera hevalan bû. Ger hinek heval ji çiyê daketibin van geliyan û pê ne hisiyabe, niha tam dema vegera wana bû. Ger hinekî guhê xwe bidaya ser wê baş bibaya. Her tişt ji hişê xwe avêt û guhê xwe da ser rêka diçû Dola Şumûniyê.

Bêhnek, du bêhn, sê bêhn derbas bûn. Dilê wî lê da û got ku hinek li ser rêkê dimeşin. Pir bala xwe dayê û wekî xişte xişteke ji kûr û dûr ve dihat ber guhê wî. Lê baş ne ewle bû. Deng wekî dihat û wekî nedihat. Yan xeyal bû, yan dengê bir rastî bû. Yan wiha li ber guhê wî diket, yan bi rastî digihişt guhê wî. Ne ji xwe bi bawerî bû, ne ji deng. Lê tişteke jî ji dûr ve li ber guhê wî diket. Gelo hinek heval ji cihna dihatin û ber bi cihna ve diçûn? Gelo êvarî hinek daketibûn û vedigeriyan? Baş e, lê çima zêdetir deng ji ber lingên wana dernediket? Çima yek ber tenê jî ji ber lingên wana nedigindirî? Gelo xeyal didît, yan êdî ji tenêtiyê hişê xwe dixwar?

Bayekî nerm xwe ji berpalkan berda Gelî. Wekî ji bo deng bi xwe re bîne ku baweriya wî xurt bike, liviyabû. Deng tije hundirê guhê wî bibû, lê zû jê vekişiyabû. Dilê wî digot ku sedî sed heval in. Lê dilê din jî digot:

- “Hîn tê gelek xeyalan bibînî. Ev lê lê ye, lo lo hîn maye. Ger wiha biçê tê hişê xwe yê maye jî bixwî!”

Dîsa ba liviyabû û dîsa deng tije guhê wî bibû, lê dîsa bi lez vekişiyabû. Vê carê germahiyek herikî nava dilê wî. Xwest ku rabe ser xwe û ber bi deng ve baz de.

Devê xwe vekir û bang kir. Heta jê dihat dengê wî bilind bû:

- “Hevaallll..., hevaallll...!”

Guhdarî li dengê xwe kir. Deng çû û li lat û zinaran ket û pêl bi pêl li nava reşahiyê belav bû. Dema vegeŕîna deng qut bû, li heviya bersivê ma, lê ti bersiv nehat. Careke din bang kir:

- "Hevaalll..., hevaalll...!"

Dîsa dengê wî li ser zinaran ji hev belav bû û pêl bi pêl çû kûrahiya şevê li hev zîvirî. Demeke dirêj, li hêviya bersivê ma. Lê ne bersiv hat, ne jî xişte xişta ligan. Şev kerr û lal bû. Dilê wî qurmiçî. Kela girî kêt qirika wî. Lehiyeke rondik hat ber mijankan û li wir qerisî. Awirên wî li ser rêka Dola Şumûniyê, di nîvê kurahiya şevê de daliqandî man...

Mijankên xwe birin ser hev û dilê xwe bi xwe şewitand. Jiyana xwe piç û piç anî ber çavên xwe û wekî li perdeya sînemê temaşe bike, tevahî di ber çavên xwe re borand:

- "Rabe ser xwe, em dakevin xwarinê..."

- "Xixxx..."

- "Çi bi te hatiye?"

- "Xixxx...immm!"

Zengilê hişyarbûnê li ser hev lê dida û hevalên wî tev rabibûn ser xwe. Nivînên xwe rast kiribûn. Dest û rûyê xwe şuştibûn û niha dadiketin xwaringehê. Hevalekî wî yê ew hîn di nava nivînan de dîtibû, hatibû ber serê wî û deng lê dikir ku rabe. Ew bi xwe hişyar bû lê ew hêz bi xwe re nedidît rabe ser xwe û gotin ji devê wî dervediket. Wekî hinek dest û lîngên wî bi nivînên wî ve girê bide û tîlên deng jî ji qirika wî bikişîne, wiha bê hal û bê deng bibû. Evarî heta dema razanê jî tiştêkî wî tinebû. Ger çi bibû bi şev çêbibû. Dixwest ku bersivê bide hevalên xwe, lê dema devê xwe vedikir, qirika wî dişewitî û ji bilî xixiniyê û iminiyê zêdetir ti deng ji nava lîvên wî dervediket. Hevalê wî tîgihîşt ku rewşa wî ne baş e. Got:

- “Ez bang li textor bikim!” û baz da çû der ve. Çend hevalên wî yê cangiran ên ji daketina xwarinê re dereng mabûn jî, bi rewşa wî hisiyabûn û li ser serê wî kom bibûn, pirsyarî dikirin ku çî pê hatiye.

Bi destê xwe digot:

- “Nizanim” û bi rastî ew jî şaş mabû ku çî bi serê wî hatiye.

Bêhneke din textorê dibistanê çentê wî di dest de, bêhnçikiyayî hat. Çawa ghişt cem, li rewşa wî pirsyarî kir. Dît ku nikare biaxive. Xwest devê xwe veke, lê nikarîbû devê xwe jî zedê ji hev vekiraya. Textor têghişt ku çî pê hatiye. Ji çenteyê xwe cîhazê xwe derxist û tansiyoona wî pîva. Pişt re derziyek li laşê wî da û got:

- “Niha kêmekî raweste, heta midîr ji malê tê. Ezê kaxezên te çêbikim û emê te rêbikin nexweşxaneyê.”

Textor rahişt çenteyê xwe û çû. Hevalên li cem jî pey re derketin ku biçin xwarina xwe bixwin. Wiha bi tena xwe ma. Di vî temenê ciwan de, ev çî bû, bi serê wî hatibû? Heta niha nexweşî çî bû nizanîbû. Lê niha bi carekê re dest û lingê wî girêdabû û dest xistibû qirika wî ku wî difetisand û dixeniqand.

Piştî taştê bi du-sê bêhnan, textor û du hevalên wî hatin, ketin bin milên wî û ew daxistin qata jêrê. Li der ve erebe li hêviya wan radiwestiya. Lê siwar bûn û çûn nexweşxaneyê. Nexweşxane li nivê bajarê Stenbolê bû û avahiyeke pir fireh û mezin bû. Textor rewşa wî tev di ber çav re derbas kir û je re kaxezek tije derman nivîsî û got:

- “Van dermanan bikire û bikar bîne. Sê rojên din jî, sibehê saet heşt, li vir amade be. Li ser zikê birçî were ku emê te ameliyat bikin. Niha derbasbûyî be.”

Piştî sê rojan çûbû nexweşxaneyê. Ew li ser kursiyekî dabûn rûniştin û yekî bi serê wî girtibû, yekî jî derziyeke ziravî dirêj di devê wî re

biribû qirika wî. Her du bixîvokên wî bi derziyê pûç kiribûn û pişt re bi meqeseke serî dirêj jêkiribûn û wekî du hêkên kewan, berdabûn sêniya li ber devê wî girtibûn. Piştî pansûmanê rabibû ser xwe û textor dîsa gotibû:

- “Derbasbûyî be, niha biçe li rehetiya xwe binêre.”

Xwestibû ku ji textor re bêje, ‘Tu sax bî’. Devê xwe bi vê peyvê vekiribû lê tenê bi devvekirinê mabû û ti deng ji devê wî derneketibû. Wê demê hemşîre gotibû;

- “Neaxive, wê xwîn ji cihê ameliyatê were!” û ketibû bin milê wî, ew biribû odeya nivistinê. Wê demê jî dilê xwe bi xwe şewitandibû ku li vî bajarê xerîbiyê, bi tena xwe, di nava paçên spî de, ne dengê wî diçû kesekî, ne kesekî pirsyariya wî dikir.

Li odeya hemberî wî keçeke ciwan di temenê wî de direjkirî hebû. Xuya ye ew jî ameliyat bibû. Çavên wan li hev diketin. Lê ne ew dikarîbû biaxive, ne ya din. Wiha sê roj û sê şêvan di wî halî de mabûn. Ger wî dilê xwe bi xwe neşewitanda, wê kî û kê dilê xwe bi xwe bişewitandiba? Her roj dê û bavê keçikê dihatin serdana wê û jê re baqeke gul dianîn. Lê yê wî kesekî wî tinebû ku were serdana wî.

Tenê roja duduyan ji dibistanê textor û du hevalên wî hatibûn ku li halê wî pirsyarî bikin û çend çîçekên ji baxçeyê dibistanê jêkiribûn, bi xwe re anîbûn. Qasî nîvsaetekê li hevûdu nêrîbûn û pişt re textor gotibû ku sibê wê werin wî bibin dibistanê û li wê derê bimîne. Roja derketibû dê û bavê keça ciwan jî hatibûn û ew biribûn malê. Li ber derî ghiştibûn hev û silav li hev kiribûn, navê xwe ji hev re gotibûn. Dibe ku ev bibaya destpêka hevnasîneke nû û dûvdirêj, lê bi lez ji hevûdu veqetiyabûn.

Piştî rehet bibû, bi rojan çûbû semta keç lê dima û li kolanan beradayî beradayî geriyabû ku bi rasthatinî lê rast were. Piştî demekê jî hêviya xwe jê qut kiribû û dilê xwe bi xwe şewitandibû. Ji aliyekê ve jî bi xwe de dixeyidî ku çima navnîşana wê jê nesitendibû. Ji bo vê jî xwe re digot 'tirsonek' û xwe jî xwe dixeyidand. Bi vî awahî evînek hîn destpê nekiribû bi dawî bibû. Ji xwe re digot:

- "Baş bû ku bi dawî bû. Mirov hez ji yeke dike, ne ji sedî."

Rast bû, lê dilê wî birçiyê hezkirinekê bû û her keça xweşik li ber dilê wî dikaribû biba evînek. Ew dil diket xweşikbûnê û dilê wî li ser xweşikbûnê diperitî...

Qapaxên çavên wî wiha giran bibûn ku xîret nedikir veke û li windabûna stêrkan yek pey yek binêre. Dem nêzîkî berbangê dibû. Di şîregewra sibehê de, ji cîhana xeyalan koçî cîhana xewnan bû.

Di xewna xwe de li ser girê pêşberî Tabûra Kinyanîş a li ser sînorê di navbera Îraq û Tirkîyê de bûn. Ji her alî ve fîşeng û rokêt diteqiyên û dijmin hawin diavêtin derdorê. Kozikên dijmin yek bi yek diketin destê gerîlan. Dawî kozika hawinê jî ket destê wan û bêhneke din girê parastina tabûrê tev ketibû destê wana. Leşkerên li tabûrê bê parastin mabûn û reviyabûn, xwe avêtibûn malên cerdewanan. Gerîlan qedereke çek û gule ji ser dijmin rakiribûn û serkeftî paş de vekişiyabûn. Sibeha din leşkerên dijmin cerdewan dabûn ber daran û ew bi tirsonekî û hevalbendiya gerîlan tawanbar kiribûn. Gotibûn ku bi sedema li hemberî gerîlan xurt şer nekirine, divê gund vala bikin û bi ku ve diçin bila biçin. Êdî çêkên xwe tev ji cerdewanan sitendibûn û baweriya leşkerên Tirk bi cerdewanên Kînyanîşî nedihat. Piştî wê bi demekê leşkerên tabûra Kînyanîş bi xwe parastina xwe girtin û gundî jî, ber bi Başûr ve dan koçkirin. Dawî

leşker bi xwe jî koçî ser tabûreke din bûn; ji ber ku ji êrîşên gerîlan ditirsiyan...

Bi teqîna guleyekê ji xew veciniqî. Gule wekî di bin guhê wî de teqiyabû. Çavên xwe vekirin û li derdora xwe temaşe kir. Di cih de tirs û xovek ketibû nava dilê wî. Roj qederekê bilind bibû. Vê nîvrojê ti gerîlan li van erdan nedigeriyan û gule nediteqandin. Ti cerdewan jî nediwêriyan bi tena xwe derkevin nêçîrê. Gelo ev çi deng bû.

Piştî bêhneke kin, guleyêke din teqiya. Wê demê têgihîşt ku gule, ji ser girê dijmin li serê ye diteqin. Lê ji ber ku diavêtin zinarên li hemberî wî, wekî di bin guhê wî de biteqin, wiha deng li ber wî bilind dibû.

Gelo ji ber çi diavêtin? Ti caran fêr nebû û ti wate jî nedayê. Ji xwe dengê guleyan jî êdî hew hat. Heta nîvro hişyar ma û guhdarî li derdora xwe kir. Nîvro gihişt biryarê ku ti xetarî li derdora wî nîne. Ji nû ve firavîn xwar. Pişt re, birîna xwe vekir û paqij kir –vê carê kurm tê de nedîtin û dilê wî rehet kir-.

Piştî paqijkirina birînê dest bi nivîsandina rapora xwe kir û heta êvarî nivîsandin domand. Her ku dinivîsand, dilê wî bêtir bi halê wî dişewitî û kela girî tije qirika wî dibû. Lê pênuşa wî qet neradiwestiya. Bi biryar bû ku heta dawî bibe. Bi rastî jî, êvarî hîn jeneratora dijmin dengê xwe nû rêkiribû ser Gelî, gihişt dawiya raporê. Kaxeza di dest de tev tije bibû. Kaxez pêça û xist bêrika xwe. Ewqasî birçî bibû û ewqasî betilîbû ku nû bi xwe dihisiya; rahişt kevçî û bêhijmar berf avêt ser zimanê xwe. Lê westandina wî her ew ber bi xewê ve dikîşand. Nivîsandin û fikrandinê ew ji hal de xistibû. Hîn kevçiyê wî di dest de, çavên wî çûn ser hev û nizanîbû çawa di xew re çûye.

\*\*\*



## ŞAZDEH

Derengiya şevê ji xew veciniqî; wekî ji jorê ve çiya dihat xwarê, kevir li ser kevir digindirîn. Carcaran kevirên mezin, car caran ên hûr dihatin gêrkirin û deng her berdewam bû.

Li saeta xwe nêrî; neh û bîst diyar dikir. Ev saet û nêvek bû di xew de bû. Li ezmên nêrî; kêr stêrk diyar dikirin. Pêlên ewran, wekî hespên boz, di ber heyvê re derbas dibûn û mirov digot qey heyv baz dide, diherike.

Ji domdarbûna deng kefxweş bû, lê çima ewqasî kevir digindirîn? Ger arteşêk li ser hev bimeşiya, tenê wê bikaribaya ewqas ber bigindirandana. Lê vê şevê çi karê arteşekê li ser wê rêkê hebû? Ger gerîlan bana, wê bala xwe bidana ser rêveçûnê ku zêde keviran negindirînin û heta ji wana bê, bêdeng bimeşin. Di vê rêkê de cihên ku lehiyê cih bi cih ax hilweşandibû hebûn û li wan cihan mirov bê hemdê xwe jî be, ber digindirandin, lê wekî din dikarîbû zêde deng dernexista û bimeşiya. Bi rastî rê teng û nexweş bû; lê yekî çavên wî saxlem û di çiyê de ne nû baya, ji bo wî zêde zorahî çênedikir. Di ber xwe de got:

- “Ger heval bin, wê çaxê hinekên nezanê meşa çiyê, yan jî awirkê di nava wana de hene ku ewqas deng derdixin. Divê yek her gav biçerixe ku ewqas deng bikaribe derbixe.”.

Ji jora Gelî hatina dengêkî din ew ji xeyalên wî dûr xistin. Bîranîna xwe ya li Gelî di nêvî de hişt û berê xwe zivirand ser jora Gelî. Hinekî guhdarî kir şûn re, têgihîşt ku dengêkî domdar ji wê derê jî tê. Dengê ji dola Şumûniyê xwe berdabû ew jî hîn didomiya. Her hal di vê saetê de û di vê şevê de du komên gerîla yê cuda cuda li ser yek rêkê nedimeşyan! Cihê digot, ‘Jora Gelî’, di rastiya de ‘Gelî’ bi xwe

bû û ji ber ku li jora wî dima, wiha dihesiband. Rêka ji Dola Şumûniyê xwe berdida, dihat ser rêka ji Şikêrokan û Hewşê Balê Ber dihat, di ber şikeftika Bihêre re derbas dibû û di Hewşiyê Karikan re xwe berdida ser dola Xilxilê û di geliyê tê de şer çêbûye re diçû ber bi Afirên Kanî ve ku dengê destpêkê bihîstibû, li derdora Şikeftika Bihêre dihat; lê dengê vê dawiyê bihîstibû, li derdora Afirên Kanî dihat û her du deng ber bi hev ve dimeşyan.

Êdî baweriya wî rûnişt ku dengên dihatin, yên mirovan bûn. Lê yan du komên gerîla yên cuda cuda bûn, yan jî yê dijmin bûn. Dawî ghişt we encamê ku dijmin ewqasî deng ji ber lingê xwe dernaxîne û pêdiviya wî pê nîne ku bi komên biçûk vê şevê bimeşe. Gelo komên cerdewanan bûn? Dizanîbû ku cerdewanan carcaran qaçaxkarî dikirin, lê çawa diwêribûn vê şevê biçin?

Hîn negihîstibû encamekê ku her du komên dimeşyan nêzîkatî li hev kirin û qarîn bi wana ket.

- “Kî ye?”

- “Tu kî ye?”

- “Heval im, heval!”

- “Em jî heval in!”

Dengê lingan û axaftin qut bû; têgihîşt ku li hev rûniştine û pirsyariya hev dikin. Ji xwe re got:

- “Ka hinekî bisebire, belkî ji bo birîndarbûna te hatine. Ger te dît ku bang li te nekirin û dengê wan domiya, wê demê tu dikarî bang li wana bikî; niha hewce nake.”

Neptî ji cihê gerîlan lêbûn, dengê bilind bû;

- “Hevall, hevalê...!”

Heta jê hat bi dengê bilind bersiv da:

- “Li vir im, li virrr... li jêra we.”

- “Temam, tamam, xwe ragire heval tîn!”

Kêfa wî hat. Xuya ye hevalan ew jibîr nekiribûn û di hawara wî de hatibûn. Êdî ti gumana wî nemabû ku ji bo wî hatibûn û wê wî bibirina. Bi heyecan û coş pala xwe ji tehtê vekir û rahişt lingê xwe ye birîndar, kişand ber xwe. Pir fikirîbû û ghiştibû encamekê ku lingê xwe bi rehnê xwe ve şidyayî girêbide wê qet neheje. Divîbû wiha li lingê xwe bikira ku dema raba ser xwe, lingê birîndar kurt ba û neghiştta ti deran û çiqasî xwe hilavêjta jî hestî di nava goşt re neçûba. Ji bo wê lingê xwe çemand; pehnî ber bi rehn ve bir û bi kefiyê şidand. Cawbaranka xwe kir pênc-şeş tew û li ser birînê pêça. Kefiya xwe ya din li ser girêda û baş şidand. Êdî ne derfeta hejandina ling mabû, ne jî dema li cihekî biketa zû bi zû hestî wê bihejiya. Ling wiha stûr û pêdandî mabû. Ji bo ceribandîna ji destên xwe hêz girt û rabû ser lingê xwe yê saxlem. Lingê wî yê din, kêmekê kaba wî derbas dikir. Ji ber ku pêdandî bi rehn ve hatibû girêdan, ji kabê û berjêr ve nedihejiya. Xwe carekê hilavist, dîsa nehejiya. Jî dîtina hevalan bêtir bi vê dozîna(kifşa) xwe kêfa xwe anî û çong da erdê, xwe dirêj kir. Êdî dilê wî ji du aliyan ve rehet bû. Yek: Ji bo dîtina hevalan! Du: Ji bo dozîna bêhejandin rabûna ser lingê xwe. Bi vi awahî wê bikarîba rêve biçûya. Girêdana lingê xwe vekir û xwe dirêj kir. Êdî li hêviya ghiştina hevalan a cem xwe rawestiya. Bi zanebûn hişê xwe bir ser bîranîna xwe ya nîvçe ku tamam bike. Ger ji ber xwe ve jibîr nekiribaya, ti caran hez ne dikir ku bîranîn an xeyalên xwe nîvçe bihêle.

- “Heval tu li ku dere yî?”

Bang li wî dikirin. Deng ji zinarên pêşberê wî dihat. Xuya ye hevalên werin cem nezîkati lê kiribûn. Serê xwe rakir û bersiv da:

- “Li jêrê, li paş keviya berfê me.”

Hevalê wî careke din pirs kir:

- “Keviya berfe li ku ye?”

- “Dakeve gelî tê bibînî.”

- “Ger daketin hêsan be tu were dakeve. Mîratê ma ne pez kovî nikarin di vir re dakevin. Tu firiya çû wir, tu çawa daket wê derê?”

- “Ka hele tu were, ezê ji te re bêjim.”

- “Erê ku ez bikaribim, ji xwe ezê werim.”

Berek ji bin lingê hevalê wî gindirî û ji zinarekî bilind pengizî ser tehtê. Wê demê têgihîşt ku hevalên wî hatine ser tehta asê û binya wana kevande ye ku tê re bikevin wê serî û guh li wana hûr hûr bibe. Dengê xwe bilind kir û bang li hevalên xwe kir:

- “Heval, jê ra we kevande ye, di kêlekê re bizîvirin.”

- “Ez jî dizanim, lê rêk ne diyar e. Ezê hinekî bigerim ku min dît ezê dakevim an na, ezê li vir rûnê heta sibehê; hal di min de nema!”

- “Baş e, hûn çawa dizanin wiha bikin!”

Li saeta xwe nêrî. Sisê û çel. Ji sibehê re zêde nemabû. Ji destê ewran, rê xuya nedikir. Ewrên reş û tarî, perdeyeke stûr kişandibûn pêşiya heyvê. Çiqasî heyvê li ber xwe dida ku ronahiya xwe dirêjî xwezayê bike, lê kê mî caran tîrêjên wê derbas dibûn; pirahî li pey ewran asê diman. Ji xwe re got:

- “Baş e ku heval tîn. Sibê nebare jî duzbe sedî sed wê bibare. Him jî wê pîs bibare.”

Xwe dirêj kir û guh da ser dengê lingên hevalên xwe. Lê zêde deng nedihat. Carcaran berekî hûr digindirî û bêhneke din, êdî ew jî qut bû. Têgihîşt ku hevalên wî rêk nedîtine û li cihekî xwe avêtine erdê. Wî jî xwe direj kir û çavên wî çûn ser hev. Bi wê bêhnê re xilmaş bû. Bi berbanga sibehê re, bi dengê hevlekî xwe, hişyar bû.

- “Mal nexerab teyr nikare dakeve vê dere, tu çawa hatiyî vê derê?”

- “Ka were, tu bi xêrê hatî.”
- “Xêredar bî û merheba û roj baş. Bi xwedê heta ez daketim vir, ez felişîm!”
- “Ka hevalên din?”
- “Kes nîne, ez tenê me!”
- “Çima?”
- “Em komek heval hatibûn ku te bibin, lê bi rê de, em li hevalên ji gund vedigeriyar rast hatin. Li nuqtê du cenazeyê hevalan dîtibûn, ne veşartî bûn. Bêhn bi wana ketibû. Ji bo wê koma bi me re çû ku cenazeyan veşêre. Heta sibehê bikaribin veşêrin û bi lez bigihên cihê xwe baş e. Ji ber ku evqas heval bi roj nikarin li vê derê bimînin; divê vegerin. Wê sibê, yan duzbe komek hevalên din rêkin û emê biçin. Ji bo te jî min hinek derman û xwarin aniye.”
- “Te tutin aniye yan na?”
- “Kêmek, bi hevalên ji gund dihatin re hebû, min çend cixare ji wana girt. Tu dizanî ku ji roja em ji hevûdu veqetiyane, yek hilm çî ye me nekişandiye. Heval tev bê tûtin in.”
- “Ka hele ez cixarekê bikişînim, xwedê mezin e.”
- “Pêşî hinek xwarin bixwe, ev heftiyek e tu birçiyî.”
- “Çi nabe. Heta tu xwarinê derxîni ezê xelaskim.”

Hevalê wî qutiya xwe derxist û da dest. Qutî hejand û vekir. Ji nêvî zêdetir tije tûtin bû û desteyek perik jî li ser bû. Cixareyek li gorî dilê xwe stûr pêça û qutî danî ser tehte. Hevalê wî çenteyê xwe ji piştî xwe daxistibû û vedipexirand ku xwarina aniye derbixe. Agir berda çixara xwe û hilmên kûr li ser hev kişandin. Dûmana germ heta nîvê kezeba wî daket û sînga wî vekir, bêhna wî fireh bû. Wekî zeyt a tu berdî ser rêka ziftê, dûman herikîbû hinava wî. Hêdî hêdî keviya berfê li derdora wî zîvirî. Lê nekîr xem. Çavên xwe girtin û kişandina

çixarê domand. Kizîniyek ji nava dilê wî hat. Wekî hinek binê zikê wî –jî hundir ve- bixurînin, bi birçîbûna xwe hisiya. Lê kurmê çixarê zora tevan bir û çixara xwe heta dawî kişand.

Êdî dinya tam zelal bibû û hevalê xwe nû nas kir ku textorê yekîneya gerîla ye.

- “Textor, rewşa hevalan çî ye?”

- “Ka hele tu nanê xwe bixwe, ezê pişt re rewşa hevalan bêjim. Ez felişîme. Divê niha binivim ku bi ser hişê xwe werim. Aha va ye xwarina te. Êdî ti çî dixwî tu dizanî. Ezê xwe bidim aliyekî û binivim.”

- “Baş e, tu binive. Dema tu hişyar bû, emê biaxivin.”

- “Temam, ezê pansûmana te jî wê demê çêbikim. Niha şev baş.”

- “Roj baş.” Keniya û xwe nêzîkî kevirê xwarin li ser e kir. Ji bo wî roj bû, lê ji bo hevalê wî şevê nû destpê dikir. Hîn dest bi xwarinê nekiribû xirinî bi qirika hevalê wî ketibû jî.

\*\*\*

## HIVDEH

Li ser sifrê kêmek qelî, kêmek penêrê sîrik, nanê tenûrê û nanê sêlê hebû. Metereyek biçûk av jî li ber bû. Dema çav li avê ket, xwarin ji bîra wî çû û dest avêt metereyê avê. Ev nêzî hefteyekê bû ku bi hesreta avê bû. Berfê ti caran cihê ava diherike nedigirt. Metere bir devê xwe û bi ser xwe dakir. Ava hênik di qirika wî re çû xwarê û heta ghişt binê zikê wî, bi hênkahiya avê hisiya. Ji kêfan re lêvên wî dikenyan. Metere danî û dest avêt pirtikeke goşt, avêt devê xwe. Ji niha ve xwe têr dihesiband. Lê dîsa jî, xwe ji sifrê paş de neda.

Piştî xwarinê giraniyekê xwe berda ser laşê wî û şikefta devê wî jî dixuriya. Zêde xwarin nexwaribû jî, lê wekî bi cembîyan xwaribe, wiha xwarinê zor dida zikê wî. Li zindanê, dema ji rojiya birçîbûna

Sibata '88an derketibûn jî wiha lê hatibû. Wê demê derfet hebû ku xwarina şil bixwin. Firdika şîr çêkiribû û xwaribû; lê dîsa şikefta devê wî xuriyabû û xwarinê zor dabû zikê wî. Qasî nîv saetê li ser xwe geriyabû, heta ku bandora li ser zikê wî, xwe berdabû û laşê wî rehet bibû. Lê niha ne xwarina şil hebû, ne jî dikaribû li ser lingên xwe bigeriya. Tenê dikaribû cixareyekê –belkî jî du cixare- bikişanda û biniviyaba; heta hevalê wî hişyar dibû. Wê demê dikaribûn sohbet bikrana û rewşa hevalan fêr bibaya. Bêtirî xwe, dilê wî bi femandara taximê ve mabû ku di ewqas şerî de tiştêk pê nehabitû, lê di paşdevekişînê de, jiyana xwe ji dest dabû û ji ber vê yekê jî ev hefteyek bû, hîn raste rast kes pê vê nehatibû. Ger ew sax baya, heta niha wê yekîneya gerîla tev seferber kiriba û ew ji vê derê biriba.

Çixareyeke din ji dûvikê cixareya yekem pêxist û dilê xwe bi xwe şewitand. Ji xwe re got:

- “Tu ne yê vî halî bû, lê carekê çêbû. Êdî zahmet e, tu careke din bi ser xwe ve werî. Ger lingê te jênebe jî, wê seqet bimîne. Tu ne dikarî bigerî, ne dikarî bilezî. Wê jiyana te li ser kursî û daran be!”

Anî bîra xwe ku li Serêkaniyê zilamekî bi lingekî hebû û çiqasî zahmetî dikişand. Wî lingê xwe, di derbaskirina sînora de bi tepinkê (mayin) dabû. Wê demê gelek kesan jiyana xwe bi qaçaxkariyê bi dest dixistin. Ew zilam jî yek ji wana bû. Laşê xwe xelas kiribû, lê lingê xwe li zeviya tepinkê hiştibû. Ji kabê û bi jêrê ve darek bi ser lingê xwe vekiribû. Lastîkek li binê dar xistibû ku nerize û neşike. Ji ber ku nikaribû kaba xwe biçemîne, dema gava xwe diavêt, lingê xwe fireh vedikir û kêmekî jî bilind radikir, wiha li erdê dida. Ji bo wê, her ku lingê xwe yê darînî li erdê dida, dengêkî zexm jê derdiket û bala herkesî dikişand ser xwe.

Ew, wê demê zarok bû û bi tirs bala xwe dida linge darînî ye qaçaxvanî. Her dem mereq dikir ku, ji ber çî lingê wî wiha nîvê nîv dar e. Digotin; ‘Di sînor de, ji destê tepinkê wiha bûye’; lê dîsa jî wate nedidayê. Sînor nêzîkî bajêr bû û li paş şiva hesinî ya trêne bû. Gelek caran diçû ser şiva hesinî û temaşeyê wî milê sînor dikir. Lê tiştêk bi serê wî nediket. Heta rojekê, li ber devê deriyê Belediyê, li rasta girseyeke gel û jendermeyan hat û nû têgihîşt ku sînor ji bo kuştin û birîndarkirina mirovan e.

Xwe bi tirs û mereq nêzîkî girseyê kiribû û di navê re rakiribû, çûbû pêş. Lê çawa derketibû pêş çavên wî bel vebibûn û poşman bibû, lê êdî nedikarîbû paş de vegeriya û pêwîst bû temaşe bikraya.

Qemyonek li pêşiya girseyê hebû û serleşkerekî potîndirêj li ber rawestiyabû. Ji girseyê zilam yek bi yek dihatin û li hundirê sindoqa qemyonê dinêrîn, pişt re paş de vedikişyan. Her carê şerleşker pirsyar dikir:

- “Tanîdî mî lan?”

- “Na wele qomîtan beg, ben tanîmadî!”

Ji ber ku bejna wî nedigihîştê, tenê du ling û seriyek di hundirê sindoqê de dirêj kirî didîtin û ti wate nedidayê. Hinekî xwe paş de da û xwe bilindî ser tiliyên lingên xwe kir. Sê laş ên di nava xwînê de, li ber çavê wî ketin. Mozên sor di ser laşên wana re difiriyan, datanîn û radibûn. Di cih de li paş xwe zîvirî û di nava girseyê re derket; bi kolanê ve baz da. Ji tirsan re kabên wî dilerizîn û gurpe gurpa dilê wî bû. Ev cara yekem bû, mirovên mirî didîtin û ji miriyan pir ditirsiya; ji ber ku gelek çîrokên ne baş, di derbarê miriyan de bihîstibû. Dayika wî herdem behsa xortê çûye gorîstanê û sing bi kirasê xwe ve kutaye digot. Dema rabibû ser xwe, kirasê wî li pey



nehatibû û gotibû qey miriyan pê girtiye, bernadin. Ji tirsan re, li wê derê bê hiş ketibû û gundî sibê çûbûn cenazeyê wî anîbûn. Ji xwe bi şev mirî ji tirbên xwe derketin û bêhn distendin. Ger yek bi şev çûba goristanê, ji ber ku wê mirî bidîtina, miriyan ew ditirsandin û digirtin xwîna wî dimijtin, laşê wî pûç dikirin ku tiştên dîtine, nikaribe ji kesekî re vebêje!

Dema ev peyv ji dayika xwe dibihîstin, di nava nivînan de kabên wî direilîn û qet nedixwest li rastî miriyekî were. Lê vê carê ne miriyek, sê mirî bi hev re dîtibûn û hîn xwîna wana jî, li ser cilên wana bû. Dayika wî gotibû; ‘Dema mirov dimire, cawê spî lê dipêçin û berya wê jî, bi ava şîrgerm laşê wî dişon’. Lê ev kesên mirî ne laşên wana şuştibûn û ne jî cawên spî li wana pêçabûn!

Êvarî, li malê, ji birayê xwe bihîstibû ku li ser sînor, di navbera leşkeran û qaçaxgeran de pevçûn derketibû û sê qaçaxger hatibûn kuştin. Leşkeran cenazeyên wana bi qemyonê anîbûn pêşiya avahiya Şaredariyê ku merivên wan werin, binasin û li wana xwedî derkevin. Lê ev sê roj bûn cenaze li wir bûn û ti kes newêrîbû li wana xwedî derketa. Birayê wî digot; ‘Ger leşker ji ber cenazeyan biçin, wê merivên wana werin cenazeyên xwe bibin. Lê leşker jî dixwazin bizanibin yên mirî kî ne ku merivên wana bigrin û bibin zindanê! Ji ber ku dibêjin; ‘Di pevçûnê de leşker jî hatine kuştin!’

Piştî bêhn bi cenazeyan ketibû, leşkeran cenaze dabûn Şaredariyê û erkdarên Şaredariyê jî ew şuştibûn û veşartibûn. Li gorî cînar diaxiftin, her şev leşker diçûn goristanê çavdêrî dikirin ku merivên wana diyar bibin. Lê ti kes nediçû goristanê. Piştî du hefte derbas bûn, êdî leşkeran destê xwe ji dîtina merivên cenazeyan şuştibûn û hew zêrevanî dikirin. Dîsa êvarekê birayê wî hatibû malê û gotibû ku; ‘Leşker dîn û har bûne; şevê din merivên wan her sê qaçaxgeran

hatine û cenazeyên wana ji gorê derxistine, birine. Hinek dibêjin; 'Ew derbasî Binxetê kirine'. Leşker jî dixwazin bizanibin ku kê alîkarî daye wana û ji ber vê kê dibînin, lê didin û pirsyariyê jê dikin...'

Destê xwe dirêjî qutiyê kir ku cixareyeke din bipêçe. Hişê wî ji ku derê çibû ku derê!? Gelo wê çawa bikarîba hişê xwe komî serê xwe bikraya ku xwe rehet bibihîsta? Çiqasî digot; 'Êdî ez li ser tiştêkî jî serê xwe nawestînim', dîsa jî bi xwe nikarîbû û hişê wî yek bêhnê tenê jî li serê wî nedima; her gav diçû paş de û bîranînên wî vedikolan.

Bi xwe şaş ma ku ji qasî birîndar bûye, çima hişê wî her paş de diçe, lê qet pêş de naçe! Tiştêkî balkêş bû; wekî xwe mirî bihesibîne, bi bêjingkirina xêr û gunehên xwe, ango bi bîranînên xwe daketibû Berê, qet nebe, carcaran li ser dema bê, xeyal dikir û bi xeyalên xwe dikeniya. Lê niha bi tevahî xeyal ji hişê wî derketibûn. Gelo zor bidaya xwe, nikarîbû dîsa xeyal bikrana?

Hişê xwe bir û anî. Du hilmên dirêj ji cixareya xwe, li ser hev kişand. Dûmana wê pif kir dîwarê keviya berfê. Dûman li dîwêr ket û belav bû. Gelo dikarîbû çi xeyal bike? Li ser hev ji xwe pirsî...

Diçû nexweşxanê. Ji çiyê diçû bajêr. Ji bajêr diçû çiyê. Lingê wî sax dibû. Na, jêvedibû... Nizanîbû çi xeyal bike. Tiştên xeyal dikirin jî li hevûdu nedihatin; yek yekî nedigirtin. Ji xwe re got:

- "Bi zorê xeyal nabe. Xeyal divê ji ber xwe ve werin. Mirovê dilrehet dikare xeyalan bike. Lê yê te, ne diyar e, wê bêhneke din, çi bi serê te were. Mirovê pêşeroja wî ne diyar be, wê çawa bikaribe xeyalan bike? Hişê te kar nake, lê laşê te ji te çêtir bi vê rastiyê dihise. Refleksa mirov, ji mirov baştir û çêtir dizane hişê mirov bikar bîne. Niha tu dibêjî qey, tê ji vê derê derkevî, evqas çiya û rêkan derbas bikî û bimeşî, xwe bigihînî bajar û nexweşxaneyan û derman bikî!

Tew li hişê te be. Ger tu bikevî destê Qesap, di wê behnê de, wê lingê te jê veke û te biavêje wan erdan. Hema ya baş, hîn te ewqas zor û zahmetî neborandiye, li vê derê serê xwe deyne ser vî berî û careke din jî raneke; ji tevî baştir e!”

- “Ma ne, hevalan gotibûn; ‘Qesap ne li Bestan e, çûye zozanan!’?” Dilê wî yê din dîsa di hawara wî de hatibû, ‘Kî dizane niha li zozanan mala kê xera dike? Li Bestan Wîcdan heye. Ma ne wiha gotibûn, qey te jibîr kir?’”

- “Min jibîr nekir, lê karê partiya me qet ne diyar e. Yekî îroj li vir e, te dît sibê ne li vir e û yê îroj ne livir e, te dît sibê li vir e! Ji bo wê, divê her roj mirov yek û yek bipirse. Xwezî niha textor hişyar ba û min pirsyarî kiriba ku dilê min rehet bikraya. Bi xwedê ku Qesap li Bestan be, ew min bikujin, ez ji vir gavekê tenê jî bi rê nakevim. Şûna ew lingê min jêbike, ezê li vir xwe bikujim baştir e. Ma çima ezê ewqase rê bimeşim û xwe biwestînim?”

- “Ka hele bila hevalê te hişyar be, bipirse, pişt re planan ji xwe re çêbike. Ma te xêr e? Him Qesap li wir be jî, nehelê ku dest birîna te bide. Tu dibêjî qey dawiya, dinyê hatiye! Ev çi bi te hatiye lo? Geh tu diçî çala bîranînan, geh tu diçî çala mirinê. Carekê jî baş bifikire û were ser ruyê erdê, ma wê cîhan hilweşe!”

Cixareya wî bi dawî bibû û agirê vê êdî tiliya wî dişewitand. Lê bi rastî ti tam jê nekiribû, ji ber ku dîsa bi tiştên beradayî mijûl bibû.

Gelo bi rastî tiştên beradayî bûn? Bi çavên xwe dîtibû ku Qesap çi îşkence bi serê hevalan de dianî û gotibû ger di dest wî de ba, di bîst û çar saetan de wê ew Qesabê bêwîcdan, der kiriba lê ti wate nedidayê bê ji ber çi partiyê ewqase qiymet dida wî û ew nediqewitand? Li gorî bihîstibû ti textoriya Qesap jî tinebû. Berya tev li partiyê bibe, karê wî sunetkirina zarokan bû. Di nava partiyê

de bibû textor û bi nav û deng bibû. Heta birîna gerîlayekî sax dikir, bi dehan gerîla jî seqet dihiştin. Ji bo wê gerîlan navê wî kiribûn 'Textor Qesap'. Lê fermanbaran jî digotin;

- "Wî canê gelek hevalan rizgar kirine!"

Bi rastî her du nêrîn jî rast bûn. Lê di vê dema dawî de, nêrîna gerîlan ji ya fermanbaran rastir bû. Dibe ku, di destpêka bijîjkiya wî de, wekî nêrîna fermanbaran bû; lê her ku ber bi roja me ve dihat, nêrîna gerîlan bêtir derdiket pêş û êdî navê Qesap ji hêla herkesî ve dihat pejirandin. Wiha ku fermanbaran jî, dema dixwestin wî bixwazin gel xwe, digotin:

- "Biçin bang li Textor Qesap bikin."

Dûvikê cixareya tiliya wî şewitandiyê avêt erdê û rahişt qutiye, dest bi pêçana cixareyêke din kir. Ji xwe re got:

- "Ger wiha biçê, heta êvarî piç tûtin namîne!"

Lê pişt re hizirî ku li gorî hevalê wî qutî daye dest, niha ne bê tûtin bû. Ger tûtina wî ev tenê ba, wiha bi camêrî qutiya xwe li wê erdê nedihîşt û pix nedikir xewê.

Lê dîsa jî, vê carê cixareya xwe zirav pêça ku çî dibe, çî nabe; bila tedbîra wî hebe. Wekî yê gundî gotibû:

- "Tedbîr navê xwedê ye!"

Dema ji Sitewrê derbasî Hezexê bibûn ku ji wir derbasî Botanê bibin; bi bîranîna vê peyva yê gundî jiyana xwe û ya hevalên xwe xelas kiribû. Ji ber wê, herdem bi tedbîr tevdiageriya. Lê carcaran ku însiyatîf ne di destê wî de ba, nikarîbû tedbîran li gorî dilê xwe bigre û bi vê sedemê xisar didît.

Rêveçûna dirêj, anî bîra xwe. Ji Omeryan bi rê ketibûn û hatibûn Sitewrê. Ji Sitewrê wê derbasî Gercewsê, ji wir jî derbasî Midyadê,

pişt re Hezexê û Newala Hespistê bibana. Li Newala Hespistê wê hevalan ew derbasî Botanê kiribana...

Dema hatibû Sitewrê, hevalên wî yê li herêmê amadekariya çalekiyekê li ser gundê cerdewanan dikirin. Ji ber ku wî jî berê li wê herêmê kar kiribû, hevalên wî gotin; 'Em govendê dawî bi hev re bigrin û wiha xatirê xwe ji hev bixwazin!' Ev pêşniyar li xweşiya wî çûbû û ketibûn ser rê. Ewqas bi xwe bawer bûn ku bê kifş ketin gund û cerdewanan çav li wana ketin tev reviyên. Gerîlan Çûn malekê û zîlamê malê derxistin ku mala sercerdewan û muxtarê gund şanî wana bide. Zîlam û keça wî bi wan re hatin ber deriyê mala muxtar û gotin ku; 'Muxtar him muxtar e, him sercerdewan e û mala wî jî ev e'.

Xaniyekî ji betonê ku şîbakeyên wê derabekirî û deriyê wê ji hesin bû, şanî wana dikirin. Gerîlan keç û bavê wê berdên û bang li malê kirin ku derî vekin. Li kêleka odeya cerdewan tê de bûn, salonek hebû û tije pîrek û zarok bûn. Him ditirsiyan him jî piştgiriya cerdewanan dikirin û ji gerîlan re digotin:

- "Biçin ji gundê me, hûn çî ji me dixwazin?"

Gerîlan jî li hewşê kom bibûn û ew ditirsandin ku cerdewan derkevin der ve û digotin:

- "Ger cerdewan dernekevin der ve emê we tevan bikujin, lê ku derkevin, tenê emê bi wan re biaxivin û biçin, tiştêkî bi kesî nakin."

Dem derbas dibû û cerdewan ji malê dervediketên der ve. Hat bîra wan ku biçin ber şîbakeyê û bombeyekê biavêjin hundir û tevan di malê de bikujin. Lê pê re hizirîn ku nû di vê herêmê di bi cih dibin û zêde xwînrijandin ne baş e, wê nexweşiyên dûvdirêj bi xwe re bîne. Dema wî bi xwe li vê derê kar dikir jî, derveyî cezakirina gundiye giliye wana li qereqola neyar kiribû û bibû sedema kuştina sê

hevalên wî, fermana kuştina kesekî nedabû. Sê - çar gundên cerdewanan tev, bê ku yek guleyê biteqînin derdest kiribûn û çekên wan ji wana kom kiribûn. Niha jî bi vê sedemê nedixwest ku xwîna ne di cih de birijînin.

Hîn di nava van hest û ramanan de bû; di wê bêhnê re, xwe di nava teqîna guleyan de dît. Destpêkê got qey cerdewanan gule reşandine ser. Lê dît ku hevalekî wî xwe daye pêş û li hundirê salonê direşîne. Hişê wî ji serê wî çû û çavên wî sor bûn. Di cih de xwe dirêj hevalê xwe kir û bi milê wî girt, ew paş de kişand, bi hişkahi got:

- “Tu dîn bûyî, tu çi dikî, kê ji te re got guleyan berde?”

Gerîlayê gule reşandiye got:

- “Heval, nayên ser rê.”

Bêtir hiş di serî de nema û ger li ser hestên xwe bandora xwe çênekiriba wê ew biavêtiba erdê û têr lê bidaya. Lê tenê got:

- “Yelah hemû xwe kom kin, em paş de vedikşin. Zû ji gund derkevin.”

Dizanîbû ku mayîna wan a li gund êdî her ku biçûya wê rewş xerabtir bikraya. Ew hatibûn gund ku bi cerdewanan re biaxivin û çekên wan ji wana bigrin. Ger cerdewanan li ber xwe bidana, dikarîbûn yek dudu ji wana bikuştana, ji ber ku çekdar bûn. Lê nehatibûn ku jin û zarokan bikujin û qet nikarîbû kuştina wana bipejiranda jî. Ger ew bi xwe fermanarê herêmê ba, niha wê gundî tev kom kiribana û gerîlayê ji rêzê derketibû û bi serê xwe ketibû xwîna jin û zarokan, wê li ber çavên wana ceza kiribaya. Lê ew rêwingî bû û piştî vê çalakiya ne serkeftî, wê rêka xwe bidomanda.

Li derveyî gund, dema xatir ji hevalên xwe xwestibû û bi du hevalên xwe re bi rê ketibû, ji fermanarê herêmê re gotibû:

- "Heval, we pir ne baş kir; ev gerîlayê bi serê xwe gule barandiye, divê were terbiyekirin û sizakirin. Ji xwe êdî ev gund jî, ji we re nabe mal; wê her dijayetiya we bike. Xwe jê biparêzin û li ti gundên din wiha nekin. Divê em gel nekin dijmin; em bi dest bixin, bikin dost! Ma ne em ji bo vî gelî evqase zor û zahmetiyê dikişînin?"

Ji wir veqetiyabûn û heta sibehê meşiyabûn. Bi roj di nava hinek kursên çilo de xwe veşartibûn û êvarî dîsa rêka xwe domandibûn. Du rojan wiha meşiyabûn şûn re êvarî li radyoye guhdarî kiribûn û şaş mabûn. Radyoyê digot:

- "Sêzdeh gerîlayên çûne ser gundê cerdewanan û du jin û zarokek kuştine, ji hêla leşkeran ve li herêma Warê Şêro hatine kuştin!" û yek bi yek navê gerîlan dijmartin... Navên radyoyê dijmartin, pirahî nas dikir û yek ji wan jî bi wana re tev li çalakiya li ser gundê cerdewanan nebibû. Têgihîşt ku dijmin bi zanebûn her du bûyer bi hev ve girêdidan. Yên li Warê Şêro hatibûn kuştin têkilîna partiyê ya ji Akademiyê û Botanê nû hatibûn bûn. Ji xwe di navbera gundê cerdewanan û cihê sêzdeh gerîlan lê hatinbûn kuştin de, ji qonaxa şevêkê zêdetir rê hebû. Lê dîsa jî dijmin cerdewanan kuştin li gundê wana çêbbibû, biribûn ser cenazeyan û gotibû:

- "Ên êrîş birine ser gundê we ev bûn."

Cerdewanan jî ji vê yekê bawer kiribûn û xwesteka xwe ya çekberdanê paş de vegerandibûn...

Piştî wê, pazdeh rojan li gundekî Gercewsê asê mabûn û ji destê tinebûna rêzaneke, nikarîbûn rêka xwe bidomînin. Baş bû ku gundekî kevnare bû û gelek şikeft û çal di binê xaniyan de hebûn. Her roj wekî ji gund wê derkevin, xatirê xwe ji mala lê bûn dixwestin û diçûn maleke din. Wê rojê li wê malê diman û ji bo derbasbûna Hezexê, li rêzaneke digeriyen. Lê yek gundî tenê jî xwe nedida ber

rêzaniyê. Ji bo wê di gund de, asê mabûn û nikarîbûn rêka xwe bidomînin. Dawiya pazdeh rojan bîr birin ku derbasî gundên Midyadê bibin, wê behtir bikaribin ji xwe re rêzanan bibînin.

Wê şevê gundiyeke dan pêşya xwe û heta gundê Selhê hatin. Li wê derê navnîşana dostekî di destê wana de hebû. Ew dost dikarîbû li wana xwedî derketa û ew bi rê bikrana. Le dema hatin ber deriyê wî, dîtî ku derî xilqandiye û kulek, mal tev tarî ye. Di wê bêhnê re, defa sihorê jî lê dida û êdî nikarîbûn bi cihekî din ve biçûna, ji ber ku bi ku derê ve biçûna her, deşta rût bû.

Hişê xwe hinekî vekola û anî bîra xwe ku berya bikeve zindanê, dihatin vî gundî û diçûn mala dostekî. Ji hevalên xwe re ev yek got û xwest ku derkevin derveyî gund. Derketin derveyî gund û rojên berya deh salan anîn bîra xwe. Gund anî ber çavên xwe û berê di kîjan alî re diketin gund, di kîjan kolanan re derbas dibûn, tev anî hişê xwe û ket pêşyê, hat li ber deriyê dostê xwe yê kevin rawestiya. Hevalekî xwe di ser dîwêr re rêkir ku deriyê hewşê veke; ji bo cînar bi hatina wana nehisiyana. Lê heta hevalê wî çû pîşt derî jina malê –jê re digotin, ‘Yadê’- “bi wana hisiyabû û hatibû ber derî. Li ber derî gihîştin hevûdu û Yadê got:

- “Kuro hûn kî ne, çi dixwazin; derkevin ji mala min!” Lê wî guh lê nekir û got:

- “Yadê ez im, ma te ez nas nekirim. Berê em gelek caran dihatin li gel te rûdiniştin.”

Yadê ji milekî ve dimeşiya malê û ji milekî ve digot:

- “Ez ji ku dizanim kurê min!? Dinya xerab bûye. Piştî hûn çûn, çend kesan cilên we li xwe dikirin û dihatin mala me, pirsyara we dikirin. Dawî kurê min girtin û birin hepsê. Ev çend sal in di hepsê de bû; rojekê hûn bi ser min de nehatin û we li halê min pirsyarî nekir. Niha



kurê min ji hepsê derketiye, hûn dîsa tên pirsyara min dikin. Na wele ez derî ji we re venakim.”

Wiha bi axaftin derbasî malê bibûn. Ji ber ku berbang nêzîk bû, zêde nikarîbûn li salonê rûniştibana. Ji Yadê re got:

- “Yadê tê bîra te odeyek me ya veşartî hebû; em di paş kewarê re diçûn wir û ji xwe re diaxiftin. Ka dîsa em biçin wê derê û ez ji te re bêjim ku van salên derbasbûyî em li ku derê bûn.”

Dema qala odeya veşartî kir, dizanîbû ku we baweriya Yadê lê rûnê û nas bike. Bi rastî jî wiha bû. Wêr hat Yadê ku mêvanên wê dost in, ne dijmin in û got:

- “Niha hûn ji rêka dûr tên, ka xwarina xwe bixwin, pişt re derbasî odê bibin.” Û derket der ve ku amadekariya xwarinê bike.

Hevalên wî ne rehet bûn û digotin ku;

- “Vê carê dawiya me ye. Sibê wê kurê Yadê leşkeran bîne ser ruhê me û me bide dest dijmin!”

Lê ew bi dostaniya Yadê bawer bû û digot:

- “Netirsin, tiştê nabe!”

Baş bû ku Yadê gotibû:

- “Kurê min ne li malê ye, çûye Batê, cem mirovên me.”

Lê kurê wê yê biçûk li malê bû. Dikarîbûn heta êvarî wî li gel xwe bigrin û bi vî awahî tedbîra xwe xurtir bikin.”

Piştî xwarinê çûbûn odeya veşartî. Ode wekî neh salan berê bû û qet guhertin tê de çênebibû. Serê xwe danîn ser çenteyên xwe û xwe avêtin erdê. Digot:

- “Yadê xiyanetê li me nake!”

Derdora nîvro Yadê bi sifreya xwarinê hatibû hundir û ew hişyar kiribûn. Hevalên wî şaş mabûn ku çawa li wana bûye nîvro û giliyê wana nehatiye kirin. Lê ew bi xwe rehet bû û piştî xwarine kurikê li

gel xwe girtibûn, rêkirin Batê ku bang li Kurê Yadê yê ji zindanê derketiye bike.

Evarî her du kur hatin û kurê mezin bi dîtina wana kefxweş bû. Derdê xwe ji wî re gotin û xwestin ku wana bibe heta Batê û ji wir û şûn re jî hinekên nas bide pêşya wana. Li ser wê yekê, çawa reş ket erdê rabûn û berê xwe dan Batê. Li wê derê du gundiyan xwe dan ber ku wana heta navnîşana dibejin bibin. Lê digotin; 'Rê dûr e û li pêşya wana qereqol heye; dem têrê nake ku derbas bikin'.

Li gund jî nikarîbûn rawestiyana. Dawî fikirî û pirsyarî kir ku li gund erebe heye yan na. Yê rêzan got, 'heye' û ger wana heta pişt a qereqolê bibe, vê şevê dikarîbûn biçûna cihê navnîşanê.

Berê xwe dan mala erebê lê bû, û ketin devê derî. Xwediyê malê û du - sê gundî rûniştibûn. Dema çav li gerîlan ketin şaş man, nizanîbûn çi bikin. Lê ji ber ku leza wana hebû guh neda şaşmayîna wan û got:

- "Şoforê erebê kî ye?"

Zilamekî dirêjî tenik, got:

- "Ez im."

- "Erebeya we heta cihekî ji bo me pêwîst e. Em lez in. Hûn dixwazin bi xweşkayî û dostanî bidin, hûn dixwazin em bi zorê bistînin. Hûn çi dibêjin?"

Şofor zêde nehizirî û bersiv da:

- "Na bavo, emê bi dostanî bidin; çima hûnê bi zorê bibin. Ma dinya xera bûye? Hûn ku derê dixwazin, ezê we bibim." Ji cihê xwe gav avêt û hat der ve. Bi hev re çûn, li erebê siwar bûn û ji gund derketin. Her du gundiyan rêzan, ser û çavên xwe nixumandibûn ku ji aliyê gundiyan xwe ve neyên nasîn.

Dema lempeyên qereqolê diyar kiribûn, erebe dabûn rawestandî û peya bibûn. Erebe paş de zîvirîbû û wana rêka xwe domandibûn. Lê di wê bêhnê re şev li rêzanan geriyabû û dest û lingên wana li hev diherbilî, nedizanîn di kîjan milî re biçin. Ji rê derketibûn û bi awayekî çolebir di bejahiyê re dimeşyan. Dawî di dil xwe de digotin ku, li dora qereqolê zîvirîne û berê xwe dane gundekî din; lê dema nêzîkî malekê bûn û li ber derî pirsîn bê çi gund e, xwediyê malê – pîrekeke ciwan û zexm bû û bi tena xwe bû- got:

- “Qey hûn dîn bûne, hûn hatine gundê qereqol tê de?”

Bi rastî jî li dora qereqolê zîvirîbûn û ketibûn gundê qereqol tê de. Baş bû ku ev mala li kêleka gund ne dijmin bû. Nan û ava xwe ji malê girtin û rêka divîbû tê re biçûna pirsîn. Jina malê got:

- “Ne baş e, hûn bê rêzan derdikevin ser van rêkên xetar!” û ji malê derket, da pêşya wana heta ku ew anîn ser rêka diçû gundekî li ser rêka wana û got:

- “Hûn qasî saetekê bimeşin, wê gundek derkeve ser rêka we û hûn dikarin yekî rêzan ji wir bidin pêşya xwe. Ger mêrê min li malê ba, minê ew gorî we kiriba, bida pêşya we; lê çûye Nisêbînê sersaxiyê; mirovekî me, ji hela dijmin ve hatiye kuştin. Xwedê ji wana re nehele. Hûn jî, hişyariya xwe bikin. Rêka hûn nas nekin, tê re neçin.” Xatirê xwe ji hev xwestin. Jin vegeriya gund û ew ketin ser rêkê. Her du rêzan bi tevahî bibûn bargiranî û digotin:

- “Me ev der, bi çavan nedîtine.”

Dawî hatin gundê jinê qalê fikir û di kêleka gund re derbas bûn. Çûn xelaseka gund. Wiha dihizirî ku li gund tiştêk biqewime jî, bikaribin pêş de biçin û paş de nezîvirin. Ji ber ku qereqol li paş wana mabû û paşdeçûna wan wê ne baş bibaya.

Di xelaseka gund de çira malekê tenê di kulekê re ronahiya xwe dabû der. Yê din tev yan ne li malê bûn, an nivistibûn. Çûn ber derî û li derî dan. Dilê wana fikir gurme gurm û nizanîbûn wê çî derketa pêşiya wana.

Neptî derî vebû û keçeke sêzdeh-çardeh salî derket pêşya wan. Keçik çawa çav li wana ket, şaş ma û qîr da malê:

- “Yabo heval hatine!”

Keçê destê xwe dirêjî wana kir û xêrhatin da wan. Di wê bêhnê re sê-çar zarokên ji keçê biçûktir, ji odeyê revî revî hatin û xwe avêtin dawa wan, xêrhatin li wana kirin. Him zarokên malê, him gerîlan şaş mabûn. Dawî keçê got:

- “Ev salek e, heval nû tîn mala me. Xuya ye heval neqeliyane; hîn hene.”

Têgihişt ku maleke dost e; lê ji ber çî ev salek e kes nehatibû mala wana, fêhm nedikir.

Zilamê malê yekî bejin ziravî dirêj bû û mirûzê wî tirş bû. Wekî bi hatina gerîlan kefxweş nebibû, qet ji cihê xwe ranebibû û raste rast pirsîbû ku li çî xwe digerin. Bersiv da pirsê xwediyê malê û got:

- “Em dixwazin biçin cihekî lê em rêkê nas nakin û rêzanên me jî şev li wana geriyane. Em dixwazin tu me bigihînî cihê me!”

Zilam bêhnêkê hizirî û tirşbûna mirûzê wî çû, xwîn hate rûyê wî; lê di wê behnê de xwe aciz kir û got:

- “Madem hûn rêkê nas nakin, mala min ji ku dinasin? Ma di gund de, qet malên din nînin?”

Da diyarkirin ku çira wî vekirî dîtine û wiha hatine û ev cara yekê tîn vê herêmê û kesekî, yan cihekî li vir nas nakin.

Zilam dîsa rûken bû û rabû ser xwe, dest avêt cakê xwe û got:

- “Ji xwe em îşev nagihên ti cihan, lê ezê we bibim. Careke din bê rêzan dernekevin ser rê, bila ev ji were bibe aqil!”

Bi hev re derketin der ve. Keça malê heta ber derî bi wana re derket û got:

- “Heval car caran werin seran li me jî bidin. Berê hûn her roj dihatin. Lê qasî bavê min ji hepsê derketiyê, êdî hûn nayên. Em bêriya we dikin. Ger hûn ji ber bavê min nayên, ji bo me werin.”

Têgihîşt ku bavê keçikê li hemberî hevalan tiştêkî ne baş kiriye, ji ber vê yekê, hevalan lingên xwe ji malê qut kirine! Ji keçikê re got:

- “Emê derbas bibin biçin; lê ezê ji hevalên li vê derê dimînin re bêjim, bila werin serdana we.”

Xatirê xwe xwest û bi rê ketin. Pir dixwest ku li wê malê rûnê û gelek tiştan bipirse, bizanibe; lê divîbû rêka xwe bidomînin. Hewa jî hêdî hêdî ber bi xerabûnê ve diçû. Stêrkan çiraya xwe vedimirandin û ewrên reş komî ser hev dibûn.

Dema ji gund derketin hindama pê re biçin naskirin û bi wî milî ve meşyan. Ewqas westiya bû ku meşa wî giran bibû. Her sê gundî ketibûn pêş û qet ne xema wana bû. Neptî baranê lê kir û şev tam tarî bû. Di wê bêhnê re, rêzanê wan, ji rê derket û berê xwe da milê Başûr. Dema berê wan ket Başûr têgihîşt ku rêka wana hatiye guhertin û şaş dimeşin. Ji ber ku divîbû bi Rojhilat ve bimeşiyana.

Bang li hevalê li pêşiya wî dimeşiya kir û got:

- “Ka bigihê pêşyê û bipirse çima ji rê derketine?”

Hevalê wî çû û hat, got:

- “Dibêje, ‘Rê dizîvire’.”

Ev bersiv neket serê wî lê dîsa jî neda der, bes got:

- “Tu jî li cem wana bimeşe û zêde ji me dûr nekevin. Dema min bang li we kir jî rawestin.”

Hevalê wî got:

- “Temam” û çû pêşiyê.

Baran bêhnekê bariyabû û rawestiyabû, lê xuya bû wê dîsa bibariya. Dît ku her dimeşyan, berê wana bêtir diket Başûr û qet rê nedizîvirî! Gotinên Keçê hîn li ber guhê wî bûn û çavê wî qet ji vî zilamî negirtibû. Bang li hevalê xwe kir û ew dan rawestin, çû gel wana. Dema ghişt cem wana, hîn ew neaxiftiye, zilam bi ser de hîlbû û got:

- “Tu çima me didî sekinandin? Ma qey tu dixwazî li vê çolê li me bibe sibeh?”

Bersiva wî neda û ji gundiyên din re got:

- “Ma hûn nabînin ku ev saeteke em ber bi qereqolê ve dimeşin? Ger em rast meşiyabana niha em ji mêj ve ghiştibûn navnîşanê. Dema em ji gund derketin we digot nîv saet rêka me maye, lê ev du saet in em dimeşin. Hûn qet ji xwe napirsin?”

Gundiyên bêrê, li xwe zîvirîn û li çiraya ji dûr ve xuya dikir ku bêrê xwe dabûnê û dimeşyan, temaşe kirin û gotin:

- “Bi rastî jî ew ne çiraya gund, a qereqolê ye. Ma çi karê me li wî milî heye?”

Zilamê rêzan ket navberê û got:

- “Em naçin wê derê. Emê çarîkeke din bimeşin, bigihên şkeftan. Îşev emê di şkeftan de bimînin. Sibehê wê pez bê wir û ezê biçim ji we re xwarin û avê bînim. Heta êvarî hûnê xwe rehet bikin û êvarî di nîv saetê de bigihên navnîşana xwe.”

- “Kê ji te re gotiye ku tu bi serê xwe biryarê bidî û me bibî şikeftan?”

- “Ez dizanim ku wiha çêtir e. Niha şev reş û tarî ye; em rêka gund nabînin.”

- “Çima tu rêka şikeftan dibînî, çima tu rêka gund nabînî? Em naçin ti şikeftan. Veger ser rê û me bibe gund!”

- “Em nagihêjin gund, du sê saet ji sibehê re yan mane, yan nemane.”

- “Çima sibê evarî emê di nîv saetê de bikaribin bigihêjinê, lê îşev di du saetan de em nikarin bigihêjinê? Ev çi rêk e? Fêm bû ku tu ti alîkariyê nadî me.”

Bang li her du hevalên xwe kir û ew hinekî dûr xistin. Bêhnekê bi wan re axift û pişt re bang li her du gundiyên din kir, bi wana re jî axift û dîsa vegeriya cem zilamê rêzan, got:

- “Em naçin ti şikeftan. Gava din em di ber hinek xirbeyan re derbas bibûn. Emê vegerin û îşev li wê derê bimînin.”

- “Hun dizanin. Ger hûn dixwazin werin kuştin biçin xirbeyan. Ma ya min çi ye? Ez bi xwe nayêm.”

- “Tu pêwîstî bi me re werî. Ger tu bi xweşkahî neyê, emê te bi zorê bibin. Tu dibêjî; ‘Tedbîr navê xwedê ye!’ Wê çaxê, emê jî tedbîra xwe bigrin!”

Dawî her sê gerîlan û sê rêzanên wan çûn xirbeyên li nîvê deştê. Şilî û şaşkirina rêkê, ew felîşandibûn. Listeya nobetê çêkir û serê xwe danî ser çentê xwe. Bêhneke din hevalên wî ew hişyar kirin û gotin ku zilamê rêzan xwestiye bireve û ew bi kotekî li der ve girtine. Li ser vê yekê got:

- “Dest û lingê wî girêdin, bila nereve.”

Zilam li ber xwe da û got:

- “Ma ne ezê hevalan bibînim û giliyê we li ber wana bikim. Ma mirov kesê bi rojî girêdide? Qey hûn kafir in? Wele ezê giliyê we bikim!”

Guh lê nekirin û wê rojê heta êvarî, ew li cem xwe girtin. Piştî nîvro, zarokê şivan pezê xwe anî derdora xirbeyê. Bang li zarok kirin û pê re axiftin. Têgihiştin ku ji gundê Deywan e û ne xerab e. Ji zarok rêka gundê dixwestin biçinê pirsîn. Zarok bi dest nîşanî wan da û dîtin ku gundê biçinê bi çav diyar dibe! Êdî ne hewceyê rêzanan bûn. Zarokê şivan heta êvarî pezê xwe li derdora wan çêrand û hişyarî li wan kir. Êvarî berya ku bi rê kevin dest û lingên zilamê rêzan vekirin û ew azad berdan. Pişt re xatirê xwe ji her du rêzanên din ên gundî sitendin û berê xwe dan gundê navnîşanê.

Dema gihiştin gund dinya nû tarî dibû. Çûn mala ku navnîşan e û pirs hevalên xwe kirin. Neptî hevalên ew pêşwazî bikrana hatin û hevûdu dîtin. Di cih de pirsyara gundê tê re derbas bibûn û zilamê rêzan ê ji wî gundî girtine kir û got:

- “Ew çi kes e?”

Hevalên wî yên herêmê kenyan û fermandarê wana got:

- “Hûn erzan filitîne. Ji ber ku em rewşa wî dizanin, xwe nêzî me nake. Lê dîtîye ku hûn xerîbê vê derê ne, daye pêşya we, xwestiye wê bibe dijmin û xwe efûkirin bide. Rast e, berê dostê me bû û hatibû girtin. Le di zindanê de daxwaza dijmin dipêjirîne û wiha tê berdan. Yanê niha bi pey serê hevalan ketiye ku diyariyê dijmin bike.”

- “Min texmîn kiribû. Lê zarokên wî baş in û bê guneh in. Qet nebe mirov tedbîra xwe bistîne û serdana wana bike.”

- “Emê bikin, lê bavê wan, ne rehet e.”

- “Ez dizanim, ku niha neçûbe qereqolê jî baş e.”

- “Ma we kengî ew berda?”

- “Heta evarî me li cem xwe girt û em bi vir ve meşyan, ew jî ber bi paş de meşiya.”



- “Ma dizane hûnê werin vê malê?”

- “Rast e.”

- “Wê çaxê ka em ji vir dûr kevin. Qet bawerî li wî nayê! Em tedbîra xwe bistînin, çi dibe bila bibe.”

Bi rastî jî, hîn kolan li xwe ne fitilandibûn, erebeyên leşkerên dijmin lempeyên xwe dan ser gund û hatin li ber deriyê mala gerîlan jê derketibûn –ku navnîşan bû- rawestiyan! Leşkeran xwe ji erebeyan avêtin û derdora malê girtin. Gerîlayên ghiştibûn hevûdu xwe berdan cihê di bin erdê de û derî li ser wana hat girtin. Leşkeran mal –a navnîşan- kun bi kun saxtî kirin û çûn mala muxtar. Ji muxtar re gotin:

- “Em dizanin ku îşev komek gerîla hat vê derê. Ka, li ku ne?”

Muxtar gotibû:

- “Madem hûn dizanin, kerem kin, bigerin û bibînin. Bi rastî jî xebera muxtar ji hatina gerîlan tinebû û ji ber wê yekê bisteh diaxift. Dema leşkeran dîtibûn muxtar wiha bisteh diaxive; qinyat kiribûn ku rast diaxive û paş de vegeyabûn. Bi vî awahî xelas bibûn û ew roj, ev roj e, gotina yê gundî ku digot; ‘Tedbîr navê xwedê ye’, her dihat bîra wî. Gotina gundî, li hemberî wî dabû bikaranîn û bi tedbîra ku gundî li cem xwe dabû rawestin, canê xwe, yê hevalên xwe û yê gundiyan rizgar kiribû.

Hizirî ku evqas bîranîn û peyva ‘tedbîr’ê ji ku hatibû bîra wî. Lê hîn bersiv nedîtibû; çavên wî çûn ser hev û di xewê re çû. Roj ne diyar bû, ji ber ku ewrên gewr ezman mişt kiribûn û yek tîrêj tenê jî di ber re nedifilitî.

\*\*\*

HIJDEH

Dema ji xewê hişyar bû, bêhna dûmanê hatibû bêvila wî. Hevalê wî rabibû û hinek qirşik kom kiribûn; hewdelek dikeland. Bêhna arê qimirî bi ser Gelî diket. Ji mêj ve bêhna xwarinê nedihat bevila wî. Ji hevalê xwe pirs kir:

- “Tu têr nivistî?”

Hevalê wî hewdel tev da û bersiv gihandiyê:

- “Têrxewkirin ji xwe nîne, lê dîsa jî min xewa xwe sitend. Rewşa te çi ye?”

- “Baş tê hesabandin. Ma wê çawa be? Ez bêjim; ‘Baş e’, derew e. Ez bêjim; ‘Ne baş e’, ew jî derew e. Hema orte ye, yanê nivê niv: Ne sax, ne mirî.”

- “Lingê te pir xisar dîtiye?”

- “Hestî şikestiye û ez texmîn dikim rehê wê jî qut bûye; ji ber ku min şerîtek spî ya ji cihê xwe qetiyabû, bi destê xwe jêvekir. Nêm (edab/elem) jî qet ranaweste. Ez her roj paqij dikim. Lê dîsa tije dibe.”

- “Tu bi çi paqij dikî? Ma derman li gel te heye?”

- “Na. Bi şutikê paqij dikim. Bê derman. Niha dev ji min berde. Rewşa hevalan çawa ye? Hûn çawa ji çeperê derketin?”

- “Em bi zorê derketin. Rê pir asê bû û kesî nas nedikir. Heta em ji çeperê derketin, bûn sê, çar parçe. Baş bû ku li Gelî Tirşkê em ji ber xwe ve hatin cem hev. Hema kê çeper qut kir, li nuqta serê daran xwe avêtin erdê û wiha em ghiştin hevûdu. Hal di kesekî de nemabû...”

- “Hevala din çawa şehîd ket?”

- “Ew li paş mabûn. Hevalên di meşê de zahmetî dikişandin, kom dikir û bi xwe re dianî. Hevalê pê re birîndar bûye digot; ‘Gule li tehtê ket û hat li me ket’. Lê ez dibejim belki ne gule be, roket be.

Ji ber ku ji jorê ve avêtine wana. Wê, li wir, di cih de, jiyana xwe ji dest daye. Hevalên pê re jî, du heval birîndar bûne, yek sax filitiye. Wî jî bi kotekî rahiştiye, çek û rextên wana û wiha xwe gihandiye me...”

- “Ez pir li ber ketim.”

- “Em tev li ber ketin. Qederekê jî ji qada şer dûr ketibûn. Gule bi ser me tevan de direşandin. Lê ji me nedigirtin. Ê wana çawa çêbû, ez hîn jî nizanîm. Ji bo wê ez dibejim ne gule, roket li tehtê ketiye û parçeyên wê li wana vegeyriyan. Tenê wiha dibe ku li wana ketibe.”

- “Ma yê birîndar çawa bi birîna xwe nizanî?”

- “Ê yekî, ji xwe çend parçeyên biçûk li çavên wî ketibûn; çavek ji xwe çûye û yê din jî xisar dîtîye. Hevalê din jî hîn qet û metên hesin û beran li laşê wî ketine, lê wiha gule ne diyar e. Ew dibejin gule li tehtê ketiye û parçeyên ji tehtê vebûne hatine li wan ketine. Lê ez jî dibêjim bi guleyan ewqas parçe ji van tehtan venabin.”

- “Bi rastî jî, tehtên Kêlê, wekî pola û hesin hişk in; lê ku bi MG3ê reşandibin çima perçe jê venebin?”

- “Wele nizanîm.”

Sêniya hewdelê ji ser agir danî. Li erdê çend caran tev da ku kêmekî bicemide. Di ber re axavtina xwe domand:

- “Bêqûtbûnê piştî hevalan şikand. Niha ku tu biçî nuqtê tê bibînî, hemû li bin wan daran xwe avêtine erdê. Sibehê, nîvro, êvarî giya kom dikin, dikelînin û bê xwê û bê rûn dixwin. Wekî pez li hevalan hatiye. Heta êvarî li derdora nuqtê diçêrin ku zikê xwe dagrin. Hevalên çûbûn gund jî vala vegeyriyan...”

- “Bi rastî evqase roj li gund çi dikirin?”

- “Neçibûn gund. Li çolê mabûn; li cem şivanan. Gundî hatibûn cem wana û gotibûn; ‘Ambargo li ser me heye, em bi kotekî zikê zarokên

xwe têr dîkin. Lê ku rewşa hevalan ewqasî xerab be, emê ji qirika zarokên xwe qut bikin û bidin we. Lê divê hûn jî hinekî xwe li me ragirin.’ Ji bo vê yekê, mehek qewl xwestine. Piştî meheke din wê qut bikişînin cihekî û heval jî biçin ji wir bikişînin.”

- “Ê baş e. Meheke din be jî, dîsa baş e. Heta mehekê, heval dikarin bi giya xwe xwedî bikin. Ger ji zozanan hinek xwê û pez were, ti pirsgirêk namîne.”

- “Oho! Ger pez were, hewceyê qût jî nake! Lê hîn tu li ku, hatina pez li ku? Beriya Tebaxê, bawer nakim pez were.”

- “Ma şivanên biryargehê, wê ti alîkariyê nedin we?”

- “Ew li Bestan in. Me du heval rêkirin ku çend pezekî bînin, lê vala vegeriyan. Gotibûn ku; ‘Tev pezê şîre di destê wana de mane û wana jî ji bo serjêkirinê nikarin bidin’. Wele bîdonek penêr rêkiribûn; hevalan di du-sê taştêyan de xwarin. Ew baş bû. Lê em bawer nakin êdî penêr jî bidin, ji ber ku ne em tenê ne; hêzên Rûsor û yên Herekolê jî tên dibin.”

Rahişt sêniya hewdelê û danî navbera xwe û wî. Ji çenteyê xwe nanekî tenûrê derxist û kir du qet, danî kêlekê. Kêmek qelî û penerê mabû jî, ji nava kîsikên tê de derxistin û danîn derdora sêniyê. Ji çentê xwe du kevçî jî derxistin û got:

- “De em bixwin. Niha te pir bêrya xwarinê kiriye. Her çiqasî ferqa me ji hevûdu tinebe jî, em dikarîbûn biçêrin, lê te nikarîbû. Yan na bawer ke em jî wekî te birçî bûn.”

- “We qe ne têr av vedixwar. Ez bi kiritandina berfê helikîm.”

- “Av mirov têr nake!”

- “Wele berfê ez têr dikirim. Bi xwedê car caran te digot qey min qelî xwariye, wiha ez têr dibûm. Lê zêde nediajot, piştî nîvsaetekê şûn re, dîsa binê zikê min dihat kolandin.”

- “Ê berf jî av e. Dema dihile mirov birçî dibe.”

Her du hevalan dest bi xwarinê kirin. Bi serê kevçiyê xwe hewdel di ser re çariyeke tenik radikirin û dibirin devê xwe. Dizanîbûn ku kevçiyê xwe kûr lêxin, germ e û wê zimanê wana bişewitîne.”

Piştî xwarinê textor sêniya hewdelê şuşt û xist çentê xwe. Kevçî jî di berfê re çikandin ku carê bi wana berfê bikole û bike av. Êdî ji ber ku sênî û metere li cem wana hebûn, dikarîbûn avê çêbikin.

Ji çenteyê xwe alavên pansûmanê derxistin û li ser tehtê rêz kirin. Wî jî dest bi vekirina birîna xwe kir. Her fitloneka şûtikê vedibû, bêhna nême difûriya. Dawî textor got:

- “Tu bawer î ku lingê te xera nebûye?”

Dema wiha got, textor Qesap hat bîra wî û kabên wî reilîn; bi tirs û xov got:

- “Erê ez bawer im, lê pirsek min ji te heye, tê rast bêjî.”

- “Ma çima derewan bikim?”

- “Nizam. Niha li Bestan, kî li nexweşxaneyê dinêre?”

- “Textor Wîcdan!”

- “Yanê Qesap ne li wir e?”

- “Na ew li derdora Feraşînê, wan deran e. Hîn li zozanan e. Te çima pirsî?”

- “Ew zalimekî textoran e, ji ber wê. Ger ew li Bestan be hewce nake heval bîn, ewqas zahmetî bikişînin û min bibin wê derê.”

- “Çima?”

- “Ma tu nizanî? Ku ev ling bikeve nava lepên wî, sedî sed wê qut bike. Wê çaxê ez, xwe bikujim baştir e.”

Hevalê wî bêdeng ma; ji ber ku birîn bi tevahî derketibû holê û nêma zer wekî zerdika hêkê, di ser re diherikî. Textor rahişt paçê paqijkirinê, di serê meqes de şidand û dest bi paqijkirinê kir. Her ku

nêm ji ser dibir, goştê sor derdiket holê û kuna birînê bêtir diyar dibû. Dawî ber devê birîne jî paqij kir. Xwest ku meqes bidehfîne hundirê birînê û paqij bike. Lê çawa serê meqes çû hundirê birînê, wekî bisteke sorkirî di nîvê kezeba wî re rabe, ewqasî ew êşand û janê da ser dilê wî. Di cih de bi destê hevalê xwe girt û got:

- “Bila niha hundirê birînê bimîne. Meqes li sere hestiyên şikestî dikevê û dilê min ranake. Bi kotekî ev çend roj in, ez ji jana wê dûr ketime, dîsa neîne serê min!”

Hevalê wî şaşmayî rawestiya û got:

- “Ger em hundirê birînê paqij nekin, nêm naraweste û birîn rehet nabe.”

- “Ji xwe birîn rehet nabe. Hundirê wê niha tije parçe marçe ne. Ka em bigihên nexweşxanê, wê demê tu bi dilê xwe dikarî paqij bikî. Niha min got ya dilê min ranake.”

Textor zêde li ber xwe neda û got:

- “Tu dizanî.”

Ne textorekî xurt bû lê bi psîkolojiya nexweş, an birîndaran kêr zêde dizanîbû û bi ve sedemê zêde li ber xwe neda. Derdora birînê bi tenturdiyotê baş şuşt û dest bi paqijkirina, birîna joretir kir. Wê demê got:

- “Tu dizanî ku kurm ketin lingê min? Birîn tije kurm bibûn!”

Textor veciniqî û rawestiya. Matmayî got:

- “Ti kurm nexuyane!”

- “Min yek bi yek bi mûçingê ew kişandin û ji birînê paqij kirin.”

- “Te baş kiriyê, lê divê dîsa jî mirov bi tedbir be. Tiştêk ji lebitîna kurm nexweştir nîne. Mirov ji ber dikare har bibe. Gerek te nehiştiba kurm bikevinê.”

- “Ez di xewê re çûbûm. Eynî vê demê bû; wekî niha tav hatibû ser laşê min û germê ez mixmixandibûm, di xewê re biribûm.”

- “Neyse emê ji bo tedbîr hinek oksîjen berdin ser birînê. Wê bişewite lê ger hîn mabe, çi kurm hebe, wê bikuje.”

Rahişt şûşeyê oksîjenê û vala kir kuna birînê. Kufînî bi birînê kêt û kefeke nîv-spî, nîv-pembeyî bi ser ket, hêdî bi hêdî vekîşiya.

Textor bêhnekê rawestiya û pişt re bi tenturdiyotê birînên mane, tev paqij kirin û cawê spî yê tenikî dermankirî, girt ser birînê û lê peça.

- “Çima dermanê te ewqase hindik e?”

- “Ewqas li cem min mabû. Hemû li birînên hevalan çû. Min kêş jî lê neanî ku biçim nexweşxanê bînim. Ji xwe li vegeê divê ez biçim û dermanan bînim.”

- “Em dikarin bi hev re biçin.”

Textor keniya û got:

- “Ka bila heval di dema xwe de werin; çûn hêsan e.”

Paqijkirina birînê hênkahiyekek him dabû birînê, him dabû ser dilê wî. Bi rehetbûna canê xwe dihisiya û kefxweş dibû. Êdî baweriya wî dihat ku wê ji vê astengê rizgar be û sax jî bibe. Piştî xwe da tehtë û xwe dirêj kir. Çavê wî li ezmên ket. Nû hişê wî hat serê wî û ji hevalê xwe pirsî, got:

- “Textor, tu dibêjî wê bibare yan na?”

Textor serê xwe rakir û li ezmên nêrî. Ezman ewqasî ji ewran hatibû dagirtin ku bê hizrandin bersiv da:

- “Heta niha çima xwe vala nekiriyê, ez şaş dimînim. Lê ku îşev jî nebariyaba pir baş bû. Divê em ji vir derkevin û biçin bin tehtekê, yan na emê li vê derê perîşan bibin.”

- “Em niha nikarin bilivin. Ger tu serê xwe rakî, tepê dijmin li hemberî te ye.”

Textor got:

- “Ez dizanim,” û rahişt qutiya xwe ku cixareyekê bipêçe. Dema qutî vekir, dît ku piç tûtin tê de nemaye. Şermokî awirên xwe berdan ber xwe. Textor bêhnekê hizirî û di ber xwe de bêdeng beşîşî. Destê xwe direjî çentê xwe kir û ji hundirê wê kîsikekî reş derxist. Kîsik vekir û qutiya tûtinê jê tije kir; qasî qutiyekê jî di kîs de ma. Di ber pêçana cixareyê re got:

- “Hemû tûtina me ev e. Tu dixwazî bi carekê re bi dawî bike, tu dixwazî kêmkê bikişîne.”

Dema dît bi textor re hîn tûtin heye, şerma wî derbas bû û wî jî cixareyek jê pêça. Piştî kişandina cixareyê, planê xwe danîn ku êvarî biçin cihekî binteht an berizde. Êdî tişteki bikin tinebû û ji xwe, xwe westiyayî dibihîstin. Destpêkê ew di xew re çû, pişt re jî hevalê wî. Du sê peşkên baranê daketin ser cawbaranka wî, lê dawiya wana ne domiya. Ji xwe, ji mêj ve çûbû cîhana xewn û xeyalan. Rojê, tîrejên xwe, ji ser laşên wana kişandin û di ser keviya berfê re, ber bi zinarê bilind ve birin...

- “Rabe, xwarinê bixwe!”

Gelo xewn didît. Di bin cawbarankê de çavê xwe vekir û guhdarî kir. Na, ne xewn bû. Hevalê wî bang lê dikir. Cawbarank ji ser sere xwe avêt. Li derdora xwe nêrî. Sî, bi tevahî ketibû ser dolê. Çawa evqasî dirêj xew kiribû? Şaş ma. Hindik mabû biba êvar. Rabû, li ser kamaxa xwe rûnişt û pişt xwe da tehtê. Hevalê wî got:

- “Min hewdelek taybet çêkiriye. Vê carê kêmekî tîr e. Min got ku tu bi şev bimeşî, tê biwestî, bila ber dilê te bigre.”

- “Ezê bimeşim ku derê? Ma wê heval werin îşev?”



- “Dibe ku werin, dibe ku neyên. Lê divê îşev em biçin cihekî binteht. Ma tu ewran nabînî?”

Serê xwe rakir û li ezmên nêrî. Ewr tax bi tax li ser hev kom bibûn û giran giran rê ve diçûn. Got:

- “Ger ba raweste, wê baran were. Niha ba wana li ber xwe dibe. Lê te dît bêhneke din, got; ‘Rep’ û sekinî. Tê çî bêjî? Tu nikarî bêjî; ‘Ka nebare, emê şil bibin, em birîndar in’. Ji bo wê, divê tu bi xwe tedbîra xwe bistînî. Xwedê gotiye; ‘Xwe ji ber dîwarê ketî bide alî’. Yanî ger tu dibînî baran tê, divê tu bintehtekê bibînî. Niha xwarina xwe bixwe, ezê biçim van joran se bikim. Dema ez hatim, reşahiyeke li ber çavê min ketibû. Ezê binêrim ku bi kêrê were, emê biçin wir.”

- “Heta ji te tê bila nêzîk be.”

- “Ezê binêrim.”

Sêniya hewdelê û qetike nan danî ber û rabû ser xwe. Dest avêt çeka xwe û di navbera keviya berfê û tehtê re bi jorê ket.

Hewdel hîn nû ji ser agir hatibû danîn, lê ji ber ku hewa sar bû, zû taxê rûyê wê dicemidî. Bi serê kevçiyê xwe wekî biqêşêre, taxê serî kom dikir û dibir devê xwe. Dizanîbû ku kevçiyê wî kêmekî kûr biçê, wê hewdela germ bikeve kevçî û devê wî bişewitîne. Ji bo wê xwarina hewdela germ, hostayî dixwest. Divîbû herdem di ser re hatiba qeşartin û wiha bihata xwarin.

Hîn xwarina xwe bi dawî nekiribû, hevalê wî vegeriya. Çeka xwe danî kêlekê û li ber sêniya hewdelê rûnişt, got:

- “Şansê me heye; min cihek dît; dûrbûna wê ji vir, tenê pêncî metre heye.”

- “Pêncî metre be ne tiştê e. Mirov dikare di ser berfê re biçê?”

- “Berf dişemite. Tenê di jê rê re tu dikarî biçî. Ji ber ku tehtê nadin mirov te hilgire.”

- “Çi nabe ezê lingê xwe girêdim û li ser lingekî bi jorê kevim. Bes di cihê ez nikaribim de, alîkarî bide min. Yê din ezê bimeşim.”

- “Ew hêsan e.”

Dest avêt kevçî û hewdela maye, xwar. Di vê navberê de wî jî lingê xwe yê birîndar bi cawbarank û kefiyê girê da û lingê xwe bi rehnê xwe ve şidand ku dema rabe ser lingê saxlem, yê birîndar negihêje erdê. Rabû ser xwe û got:

- “Ez hêdî hêdî diçim. Xwedê bike nêzîk be!”

Destê xwe da ser tehtê. Ji tehtê hêz girt û laşê xwe bilind kir, gava xwe pêş de avêt. Lingê wî yê birîndar hejiya û hestî ghişt ser goşt, lê zêde tê re neçû. Kêmek jan bihîst.

Cihê tê re bi jorê biketa, navbera zinar û keviya berfe bû. Firehiya xwe qasî du gavan hebû, lê cih bi cih dibû gavek, û cih bi cih dibû sê-çar gav. Divîbû di navbera kevir û latên mezin re bimeşiya. Li hinek cihan keviran rê nedidan û divîbû di ser re biqeviziya. Wê demê bang li hevalê xwe yê textor dikir. Textor dihat ser tehtê, bi destê wî digirt û ew hildikişand gel xwe. Pişt re bi xwe dadiket û dîsa gav diavêt. Hinek cih jî asê û bilind bûn ku bi destgirtinê jî nikarîbû hilkişiyaba. Wê demê textor dihat, ew dikişand ser keviya berfê. Li ser keviyê gav bi gav cihê lingê xwe dikola û ew bi pey xwe re dixîjiqand; heta ku cihê asteng derbas dikir, dîsa dadixist ser reşahiyê.

Ji ber wî, feqîrê textor jî nikarîbû biçûya, bêhna xwe veda. Carcaran textor xwe deh-pazdeh gavan dûr dixist û li ser erdê pala xwe dida berekî ku kêmekî çavên xwe nerm bike; di wê bêhnê re bang lê dikir û ew vediciniqand, digot:

- “Hevalê Textor, zû were min di vê astengê re hilkişîne jorê; destên min êdî laşê min ranakin.”

Wê demê Textor ji pêwîstî dîsa radibû ser xwe, dihat bi destê wî digirt û alîkarî didayê, ew ji astengê diborand û cardin vedigeriya ser reşahiyê ku palde û çavên xwe binermijîne. Lê hîn çavên wî neçûne ser hev, dîsa bang lê dikir û vê carê dest bi gazindan dikir, digot:

- “Ya Textor, heval! Ka te digot; ‘Pêncî gav yan heye yan nîne!’? Malmîrat ev sedûpêncî gav in ez xwe hildiaavêjim, hîn berteht merteht ne diyar e. Ka li ku ma, ev şikefta te ya berteht?”

Wê demê Textor bê dilê xwe jî be, bersiv lê vedigerand û digot:

- “Ma ew sedûpêncî gavên te avêtine, ez dikarim di deh gavan de bimeşim. Tu jî dibêjî qey tu rê ve têyî? Ka bimeşe, tê li me bikî sibeh û hîn tê neghiştibî bertehtê ku tu bi vî awayî bimeşî!”

- “Ez çi bikim? Ma tu li van teht û berên asê nanerî Textor? Wele bêhna min çikiya! Tu dîsa dua bike ku ez evqase rê meşiyam. Ka bi rastî bêje, çiqase rê ma?”

- “Wele li gorî min, hê bîst gav mane; êdî tu li gorî xwe hesap bike.”

- “Baş e. Êdî ezê bijmêrim, ka bê rast derdikeve yan na! Tu dibêjî qey ez şervanê nû me tu min dixapînî! Destpêkê te gotibaya pênc sed gav in, minê psîkolojiya xwe li gorî wê eyar bikraya! Dema mirov şervanên nû tîne, bi rê de diwestin û dipirsin ku kamp li ku derê ye, wê demê jî rêber dibêjin; ‘Aha li pişt vê neqebokê ye!’ Lê ne yek neqebok, sed neqebok derbas dibin, kamp hê jî li pişt vê neqebokê ye! Te jî îroj li min wiha kir.”

- “Na wele, ez ji dil dibêjim nêz e. Ka tu bimeşe, tê bi xwe jî bibînî ku nêz e.”

- “Temam, ez têm...”

Dîsa hêza xwe da ser her du destên xwe û laşê xwe ji erdê bilind kir, lingê xwe rakir û di ser berekî qasî nawqa wî bilind re derbasî milê

din kir. Lê bi rastî bêhn lê çikiyabû û pêwîst bû bêhna xwe vede. Li ber wê keviya berfê û di wê sermayê de, xwêhdaneke wiha bi laşê wî ketibû û ew têhnî dikir. Lê newêrîbû di wê bêhnê re berfê bikiritîne, ji ber ku dizanîbû di wê rêveçûn û westandinê de çiqase berf bixwara, bê fêde bû, bêtir wê têhnî bibaya.

Bi gavên xwe, bîst gav hijmartin şûn re, deh gav jî ji bo xatirê hevalê xwe hijmartin û ewqasî ji hal de ketibû ku pal da berekî û dîsa qîr da hevalê xwe yê textor. Lê hevalê wî diyar e, yan xilmaş bibû, yan di xew re çûbû, yan jî ji acizî deng dernexist. Piştî sê çar banglêkirinan, bêdeng meşiya hat û got:

- “Dîsa çi bû; tu hîn du gavan nehatiyî, tu qîr didî!? Tu nahêlî ez bêhnekê çavên xwe nerm jî bikim. De bimeşe heta xelas be!

Bi vê xeyda hevalê xwe, li ber xwe ket û dengê xwe nekir. Lê Textor raserî serê wî rawestiya û neçû, careke din pirs kir:

- “De ka bêje çi ye? Tu nikarî astengê derbas bikî?”

Di dilê xwe de şikestibû û evşikestina xwe bi bêdengî dida der. Rabû ser xwe û her du destên xwe avêtin berê qasî bejna wî bilind ku derbasî milê din bibe. Hevalê wî dît ku berê li pêşiya wî bi rastî jî ji bejna wî bilindtir bû û yekî saxlem bi kotekî dikarîbû di ser re biqeviziya. Ji ser berfê, xwe avêt ser ber û destê xwe dirêj kir, got:

- “Ka destê xwe bide min. Tu dizanî ku di vir re nikarî bi tena xwe derbas bibî, dîsa jî ji eksê re, tu xwe lê diqelibînî!”

Destê xwe dirêjî Textor kir û zor da laşê xwe ku bi jorê ve were kişandin. Lê ber ewqasî bilind bû ku pêwîst ma lingê wî bi ber ve bixîjiqe û zor were ser lingê birîndar. Lingê birîndar di navbera kişandin û tehtê de hat givaştin û janê da ser kezeba wî. Bes ji sedema ku aciz bibû, jana xwe neda der û gez li lêvên xwe kir, heta bi ser ket.

Bi serketinê dît ku kevirekî din û yekî din wekî yê di ser re derbas bûye li pêşiya wî ne û navbera wana jî vekiriye û bi daketin û hilkişandinê wê kezep lê peritîbaya! Ji hevalê xwe re got:

- “Ez nikarim van her du-sê kevirên bilind derbas bikim; a baş tu min bikişînî ser berfê û wiha em vê derê qut bikin.”

Hevalê wî dengê xwe nekir û derbasî ser berfê bû. Bi serê pêlava xwe cihê lingên xwe kola û destê xwe dirêjî wî kir. Wî jî bi destê hevalê xwe girt û xwe hilavêt ser berfê! Lê bi hilavêtina wî û ketina lingê wî yê ser berfê re, şemitîna wî ya bi jêrê ve bû yek. Baş bû ku ne li ser aliyê xwe yê birîndar, li ser aliyê saxlem şemitî û bi vê sedemê êş nedît. Textor jî kir ku pê re bişemite û ger her du bi hev re şemitîbana, li cihê dest pê kiribûn jî rawestiyabana dîsa baş bû! Lê bextê wî vekirî bû ku Textor cihê lingên xwe di berfê de baş kolabûn û bi vê sedemê pê re neşemitîbû û ew jî dabû rawestandî. Textor ew kişand gel xwe û rê dayê ku lingê xwe deyne cihê lingê wî. Pişt re bi serê pêlava xwe cihê lingê xwe qasî nîv gavê joretir kola û xwe hilkişand wê derê. Dîsa bi destê wî girt û rê dayê ku were cihê lingê wî. Bi vî awahî heta rasteya her sê beran derbas kirin, her du jî di nava xwehdanê de bêhnçikiyayî man. Bi xelaseka rasteya kevirên bilind re, Textor dîsa alîkarî dayê û ew daxist ser bejahiyê û xwe jî li ser berfê avêt erdê. Qutiya xwe ji bêrîka xwe derxist û dest bi pêçana cixareyekê kir.

Dema dît Textor cixareyê dipêçe, kurmê çixarê di nava wî de serî hilda û agir bi kezeba wî ket; lê dil negirt, ji hevalê xwe bixwaze! Dibe ku careke din xwe bi ser de aciz kiriba! Wê demê, wê bi tevahî navbera wana xera biba û vê yekê jî wê bandor li ser tevahiya jiyana wana bikraya. Bes dilê wî jî ecêb diçû cixareyekê! Çavên wî li paş man û dîsa dest bi domandina rêka li ber xwe kir. Neptî dûyê

cixareya hevalê wî kişandiye, heta bêvila wî hat û derbasî mejiyê wî bû. Li xwe vegeriya ku bang li hevalê xwe bike û bêje; ‘Ka cixareyekê ji min re jî bipêçe!’ Lê kir û nekir, wêr nehatiyê bixwaze û bi wê hisretê rêka xwe domand.

Qasî bêhneke din ku dîsa di nava xwêhdanê de mabû, Textor di ser berfê re meşiya û hat pêşiya wî, got:

- “Êdî zêde rêk nema; cihê ez lê rawestiyame xîz e. Dema tu gihîştî vê derê bang li min bike, ezê werim cihê berteht nîşanî te bidim. Ji vê derê û şûn re rêk rast e!

Pişt re destê xwe dirêj kir û cixareya di dest de dayê û bêdeng meşiya çû.

Bi girtina cixarê hinekî bêhna wî hatibû ber û di dilê xwe de got ku, baş kiriye cixare ji hevalê xwe nexwestiye. Dema ew bi xwe hizirîbû cixareyekê jê re bîne, ev baştir bû. Vê yekê nîşan dikir ku acizbûna Textor ne ji wî, ji rewşa tengezar a wana bû.

Cixareya daye dest, heta dawî kişand û wiha bi xwe hisiya ku kêmekî be jî pê germ bûye û xwêhdana wî lê sar dibe. Nexwest bi tevahî xwêhdan lê bicemide û dîsa dest bi domandina rêka li pêşiya xwe kir. Dîsa wekî berê destên xwe datanîn ser keviran û laşê xwe bilindî jorê dikir û di ser re diqevizî. Lê bêhneke din êdî kevirên li pêşiya wî biçûk bûn û her ku çû wekî hevalê wî diyar kiribû, erd bû berhûrik û xîz. Dema gihîşt ser dera xîz, xwe zikûpişt avêt erdê û bêhna xwe veda.

Heta xwêhdan lê cemidî û bi xwe hisiya wê êdî biricife, xwe komî ser hev kir û bang li hevalê xwe kir:

- “Textor, heval! Tu li ku derêyî? Va ez hatim wî cihê te digot!”

Piştî du sê bangkirinan hevalê wî ji cihekî dûr û di ser wî re bersiv dayê û got:

- "Xwe li dengê min bigre û were."

Berê xwe da cihê dengê hevalê wî jê tê û dît ku cihekî kaş e! Ger serjêre ba ya dikarîbû xwe berdaya, lê wê çawa bi kaş ve hilkişiyaba? Ji xwe li ser lingekî, di dinyê de nikarîbû bi jorê biketa! Ger lingê xwe vekiriba jê bê fêde bû; ji ber ku nikarîbû xwe bidaya ser û berûvajî wê, her bihejiya wê agir bi kezeba wî biketa! Wê demê dikarîbû çi bikra? Ger bang li hevalê xwe kiriba û gotiba; 'Were min li pişta xwe bike û bibe!' wê feqîrê hevalê wî, di vî kaşî re, çawa ew daba pişta xwe û biriba?

Dawî dîsa qûn da erdê û li ser rêyeke çareseriyê hizirî! Pişta xwe da ser xîz û awirên xwe dirêjî ezmên kirin. Ezman ewqasî tarî bû ku kenekî bê hemdê wî ket dilê wî û di dilê xwe de got: 'Sedî sed ev ewr rewşa min dizanin û dilê wana bi min dişewite, ji bo wê xwe nagivêşin. Li hêviya min in ku ez bigihêjim cihekî ewle û dema ez bigihêjim wê derê jê wê lehî û tofanê rakin!'

Careke din, pişta xwe ji xîz vekir û li kaşê bilind nêrî. Di wê bêhnê de ramana wî ket nava liv û tevgerê û ji xwe re çareserî dît. Di dilê xwe de got; 'Belê ya! Ez nikarim pêşpêşkî biçim, wê demê dikarim paşpaşkî biçim!'

Li ser kaşê xîz rûnişt, pişta xwe da kaş û xwe paş de gav bi gav hilkişand. Ji ber ku lingê wî li jêrê dima û hêz û giranî nedihat ser rehet bû û her carê qasî buhistekê xwe bi jorê ve dida. Dîsa wekî li ser keviran dimeşiya, her du destên xwe dida ser xîzan, ji destên xwe hêz digirt û laşê xwe vê carê bi paş de diavêt. Dema laşê wî bi paş de diçû, kamaxa xwe datanî erdê, lingê xwe yê saxlem ê lingê birîndar li ser girêdayî ye, dikişand ber bi zikê xwe ve û dîsa ji her du destên xwe hêz digirt, heta lingê wî bi erdê re rast dibû, laşê xwe radikir û paş de diavêt. Bi vî awahî bêhneke dirêj bi jorê ve hilkişiya.

Dema gihişt hindama lateke bilind, li derûdora xwe nêrî û ti binteht an şikeft nedîtin, dîsa bang li hevalê xwe kir û got:

- “Heval, Textor, hevall! Tu li kuyî mîratê? Ka were cihê te digot diyar nake!”

Bêhneke kin şûn re Textor dîsa bêdeng hat û di cihê lê rawestiyayî re ber bi milê çepê ve zîvirî û berwar meşiya, pê re got:

- “Bi pey min de were; vaye hindik maye!”

Vê carê xwe bi milê rastê ve zîvirand û berwarkî xwe li ser berhûrikan kişkişand. Qasî bîst gavan rê sitend şûn re, dît ku hevalê wî li jora wî, li ser bertehteke spî rawestiyaye! Dîsa paşpaşkî xwe hilkişand û hat ber devê bertehtê. Xwe bi kevandeya bertehtê girt û rabû ser xwe. Hevalê wî destê xwe dirêjî wî kir û laşê wî hilkişand jorê. Dema hilkişiya jorê dît ku bi rastî jî berteht qasî kesek bikaribe xwe tê de dirêj bike, bi binê tehtê ve dibû vêl. Li wê derê hevalê wî cawbaranek li erdê raxistibû. Alîkarî dayê ku were ser cawbarankê û xwe dirêj bike. Pişt re cawbaranka din jî kişand ser wî û got:

- “Li vê derê cihê me her duyan nîne. Bêhneke din jî wê baran bibare. Li vê piştê cihekî binteht heye. Cihê wê asê ye, tu nikarî hilkişî wê derê. Ezê biçim li wir bimînîm. Dema pêwîstiyê te çêbû bang li min bike, ezê werim.

Bi rastî di ber ewqase berf re meşiyabû, lê piçek jî neavêtibû devê xwe û niha kezeba wî ji têhnîbûnê dişewitî! Careke din jî ne dikarîbû daketa jêrê û ne jî dikarîbû vegeriya cihê xwe. Dawî hemû wêra xwe komî ser hev kir û got:

- “Ger zahmet nebe, te hinek berf anîba û danîba vê derê. Ez dikim ji têhnîbûnê bifetisim!”

Hevalê wî rahişt sêniyekê û berê xwe da jêrê. Lê dema xwe berda, dengê wî hat û got:



- "Mîratê tu di ber geliyekî tije berf re hatî, li vê derê dibêjî; 'Têhnî bûme!' De, te têr xwariba û wiha derketibayî jorê!.."

Neptî ser sêniyê tije berf, hevalê wî hat û sênî danî ber serê wî. Dûsê gavan meşiya şûn re li xwe vegeriya û got:

- "Va ye ji te re qutiya tûtînê! Lê tu dizanî; dixwazî îşev tevî bikişîne û biqedîne, dixwazî piç û piç bikişîne! Ev para te ya dawî ye, bila hayê te jê hebe!"

Qutî da dest û di rêka hatiye re bi jorê ket û hew pêjna wî hat. Şewata kezeba wî hîn nerawestiyabû! Rahîşt dirgek berf û bir devê xwe, mîjt. Devê wî tije av bû û ji qerisînê şewitî. Av daqurtand û dîsa mîjt; dîsa bi hênkahî û şewata ji qerisînê tê hisiya. Piştî wî dirgî, dirgeke din wiha xwar û nû têhnîbûna wî kêmekî rawestiya. Di wê bêhnê re dilê wî çû cixareyekê û dest avêt qutiya Textor daniye ber wî. Qutî vekir û dît ku heta nêvî tije ye! Kêfa wî hat û cixareyeke stûr pêça; lê pê re gotina hevalê wî hat bîra wî û bi her du tiliyên xwe, tûtîn ji ser pelê tenik kir û cixare nîv-stûr pêça. Piştî pêçanê bir nava lêvên xwe û hesteyê xwe bê tirs pêxist. Vê carê cihê wî, ne li hemberî girê dijmin li ser e bû û li gorî wir çep diket. Ji cihê lê bû tenê girê raserî Dola Şumûniyê diyar fikir ku ew jî heta dijmin derneketiba operasyonekê kes nedihat serê wî girî. Di vê şeva ji baranê re avis de jî, ti caran dijmin dervediket operasyonê û nedihat serê van zozanên ku di vê bêhnê de hirçan jî xwe jê berdidan xwarê.

Hîn çixareya xwe bi nêvî nekiribû ku ewr bi hatina wî ya bintehtê hisiyân û dilopên xwe weşandin erdê. Destpêkê çend dilopên girs pêk re weşandin. Pişt re bêhna xwe vedan û bi bayeke nerme re, vê carê nerme nerme û nazdar daketin erdê. Bêhnekê jî wiha bariya şûn re, ba rawestiya û baranê êdî wezna xwe girt; dest bi xuminiyê

kir. Bi destpêkirina barana xweş bi xwe xisiya ku hewa û bi hewayê re laşê wî germ bû û nermijî. Dengê xumîniya baranê wekî lorîka dayikê dihat guhê wî û mijankên çavên wî, wekî sed kîlo hesên pê ve hatibin daliqandin, xwe berdan xwarê û careke din kir û nekir, nikarîbû ew ji hev veqetandibana...

\*\*\*\*

## NOZDEH

- "Ew kî ye?"
- "Heval in, heval."
- "Vê baranê, ma we xêr e?"
- "Em carekê derketin ser rê, êdî nikarîbûn vegezin."
- "Kesê dîn be jî, vê şevê dernakeve der ve."
- "Em derketin."
- "Derbasbin hele."

Derbasî odayê bûn. Çenteyê xwe bi destekî ji piştî xwe danîn, bi destê din çeka xwe sipartin dîwêr. Kefiyên xwe ji serê xwe vekirin û rûniştin. Xwediyê malê pirs kir, got:

- "Hûn tenê du kes in?"
- "Rast e."
- "Ez biçim deriyê hewşê bigrim. Ji xwe vê baranê dijmin jî ji kuna xwe dernakeve. Kes bi we nehisiya?"
- "Bawer nakim. Vê şevreşa tarî û ve xopanê kî bi kê dihise?"
- "Li gorî kuçîkên gund bi we nehisiyan, bawerkin hayê xwedê jî û yê ebdan jî ji we nîne. Ka ez derî saxlem bikim, pişt re emê biaxivin." Zilamê malê derketibû der ve û wan jî xwe nêzîkî sobê kiribûn ku cilên xwe ziwa bikin, jina malê qeflek darên hişk anî û xist sobê. Sobe her ku disincirî, hilm ji kab û milên wana bilind dibû. Xwediyê

malê hat hundir û ji jina xwe re got; 'Xwarinekê amade bike', pişt re li cem her du gerîlan rûnişt û li hêviya axaftina gerîlan ma.

- "Gelo tu sibê dikarî biçî bajêr?"

- "Ez dikarim biçim, ji bo min ne tiştê e; lê wê gundî, tev bêjin; 'Gelo xêr e, ve baranê diçe bajêr?'"

- "Çi nabe, dibe ku sibê baran veke. Ezê notekê binivîsînim. Divê tu sibê bibî bajêr cem textorê dostê me; tu dinasî. Hevalên li Botanê ew xwestine Cizîrê. Divê biçê. Cihê ku biçeyê ezê di notê de diyar bikim. Li wir birîndarek heye. Wê derman bike û were. Ji bo ku saxlem biçê û saxlem were, divê bi erebeya şaredariyê biçê. Ji bo wê, tê notekê jî bibî bidî reîs û silavan jî lê bikî. Ger ne wiha be, textor newêre biçê; ez wî dinasim. Divê tu sibê van karan pêk bînî. Heta tu pêk neynî, divê tu venegerî malê."

- "Înşalah."

Deftera xwe ji bêrika xwe derxist û dest bi nivîsandinê kir. Di vê navberê de jina malê sifreyeke dewlemend anî ber wana. Mast, nîvişk, penêr, hêken qelandî, nan û çayê!

Heta notên xwe nivîsî, li hêviyê man. Pişt re bi lez dest bi xwarinê kirin û dema qedandin, her du not cuda cuda pêçan û dan destê xwedyê malê û got:

- "Emê rabin biçin, lê sibehê operasyon jî rabe, divê tu van notan bibî û bi cih bikî."

Xwedyê malê matmayî bi milê wî girt û bi berger got:

- "Heval hûnê biçin ku? Vê baranê vê nivê şevê hûnê li ku xwe bisitirînin?"

- "Em dikarin li çareya serê xwe binêrin. Tu vana bi cih bîne, karê te ji me nîne?"

- "Bila. Serçavan. Heta ez pêk neynim, ez nayê malê."

- "Baş e, emê jî rabin, dereng e."

- "Xwezî hûn bimana, cih hebû."

- "Karê me yê din jî heye. Divê em xwe nêzîkî cihekî din bikin. De bi xatirê we."

Gerîlan rabûn ser lingan, çenteyên xwe dan piştta xwe û çekên xwe hilgirtin. Kefiyên xwe li serê xwe pêçan. Xatirê xwe ji maliyan xwestin û derketin der ve. Li ber dîwarê hewşê rawestiyan, heta ku çavên wana fêrî reşahiyê bibin. Baranê leza xwe kêm kiribû, lê di meZRîban re wekî lehiyê diavêt.

Dema ber lingê xwe dîtin, xwe di deriyê hewşê re avêtin kolanê û berê xwe dan rêka ji gund dertê. Ji ber meZRîban geh xwe diavêtin milê rastê, geh diavêtin milê çepê. Berya gund derbaskin rawestiyan û guhdarî derdorê kirin, lê ji xurmîniya baranê ti deng nedihat bihîstin. Rêka, kêlekên wê bi keviran lêkirî derbas kirin û ketin erda beyar a dorvekirî. Du-sê gav avêtin ku ronahiyek wekî çirayekê bilind bû û derdor li wana bû roj. Şirqîniyek wekî ya birûskê bi ser wan de teqiya û xwe devdevkî li erdê dîtin...

Bi dengê birûskê ji xew veciniqî. Laşê wî tev di nava xwêhdanê de mabû. Baran bibû lehî û di kêleka berizdeyê re diherikî ser geliyê berfê. Ezman dîn û har bibû. Birûsk li ser birûskê dişerqîyan û di her şerqîniyê de şev lê dibû roj. Xewn û rastî li ber çavên wî tev li hev bibûn. Rabû, li ser xwe rûnişt. Kîsê tûtînê derxist û cixareyek pêça. Bir nava lêvên xwe û pêxist. Çend hilm li ser hev kişand û guhdarî dengê baranê kir. Ew roja ketine kemînê hat ber çavên wî. Dîsa ji erd û ezmanan baran dibariya. Lê li şûna birûskan gule û rokêt li pey hev diteqiyan...

Çavê xwe li hevalê xwe gerand. Ne li kêleka wî bû. Gelo xwe dabû ku derê. Çend dangan bang lê kir. Lê ti bersiv nehat. Şev ewqasî reş û tarî bû ku du gav pêşya wî diyar nedikir. Çixara xwe bi dawî kir û bi erdê ve eciqand. Kefî û cawbarank careke din kişand ser xwe û çavên xwe birin ser hev. Lê xew neket çavên wî û hişê wî dest bi ger û lêgerînê kir. Dîsa raman, hest û nêrîn tije hişê wî bûn û ew birin cîhana gengeşeyên bi dilê xwe re...

‘Jiyan çi bû gelo? Her, êş, kul, keder, zor û zahmetî çima barê wî bûn? Ji ber çi wekî xelkê kêfxweşî nedijiya? Ne di zaroktiya xwe de, ne di ciwantiya xwe de bi dilekî rehet tevnegeriya bû; ji ber çi? Gelo wê heta kengî ev bidomiya? Di zaroktiyê de feqîrî, di ciwantiyê de zindan û pişt re jî, salên li navsera çiyân, di nava sar û seqemê de; rojek têr sed roj birçî; her bêhnê li cih û warekî; êvarî bimeşe heta sibehê û roja din dîsa bimeşe û dîsa bimeşe!.. Ne rojek, ne du roj; ne salek, ne deh sal, ne bîst sal!...’

‘Gelo ev jiyan qedê bû? Gelo pêwîstiyek bû? Çima ew jî, wekî zarokên xelkê li ser xakeke azad, bê ku bi zor û zahmetiyan re rû bi rû bimîne, nehat ser ruyê dinyê? Çima bapîr û dapîrên wî, pix kirin xewê û welatê xwe ji neyaran re hiştin ku werin li ser pîkolê bikin û îroj ew jî pêwîst bimînin derkevin serê çiyân û tiştê berê hêsan, niha bi zahmetî bixwazin pêk bînin.’

‘Dîrok anî bîra xwe û maf da ku di dema hilweşîna împaratoriya Osmaniyan de serokeşîrên kurdan hêza xwe kiribana yek, ne Misto Kemal, wê kurdan Anatolya bigirtana dest û welatê wana niha wê azad baya! Wiha hizirî ku ev derfet hebû, lê kurdên wê demê bi kêrî pêkanîna vê yekê nehatibûn. Niha wî jî êşa wana dikişand. Ger wana karê xwe kiribana, çi pêwîstî pê hebû ku niha rabin bi vê ciwaniya xwe derkevin navsera van çiyân û li hemberî artêşeke zordar

têbikoşin. Gelo çima kurd ji her kesî re avakar, tenê ji xwe re xerabkar bûn? Alîkarî dan tevahiya dewletên serdestê xwe û ji wana re dewlet ava kirin û xwe jî kirin bindestê wana û qet yekî nehizirî ku ji xwe re jî dewletekê çêbike! Herodotos digot ku, dema Astiyag dibîne Harpagos li hemberî Persiyayî şer nake û diqulipe milê wana, jê re dibêje; “Pîso, şûna te neyar li ser gelê xwe kir hikimdar, te ez bikuştama û keyitiya min ji xwe re biribaya ku ne Pers, Med serdarê gelê xwe ba na! Lê bi vê kiryarê te kir ku heta heyî Med di bin destê biyaniyan de binalin!” Bi rastî jî ji wê rojê û vir ve Med û zarokên wana kurd, rojekê xweşî nedîtibûn û her di bin destê biyaniyan de naliyabûn. Diyar e wî jî ev qeder parve kiribû û ji bo çirandina vê qedera bêbext, çî ji dest hatibû, danîbû holê, lê wekî di çîrokê de dihat gotin; ‘Bextê wî ketibû binê çalekê ku werîsê heft gundan bi ser hev vekiribana jî dîsa nedigihîşt binê wê!’...

Sibehê dema hişyar bû, hîn ev pirs û raman di serê wî de bûn. Li saeta xwe nêrî; pênc û çel. Hîn zû bû. Baran rawestiyabû, lê ezman hîn tije ewrên reş bû û ji berpala jî hîn lehî dihat. Xuya bû ku baranê nû navber dabû barînê. Kêmek ba carcaran dilivîya û hinek peşk bi xwe re belav dikirin. Car caran du sê peşk ji ezmanan jî dadiketin, lê nedidomiyan.

Qasî çarîkekê wiha gêj gêj li cihekî awirên wî daliqandî man; wekî nizanibe çî bike, wiha leşê wî û hestên wî bê livandin, rawestiyayî man. Piştî çarîkekê, bi xwe hisiya ku têhnî bûye. Destên xwe dan erdê û bi qûnkişkê xwe gihand cihê cawbarankê. Berf hîn qerisî bû. Bi lapûşkên xwe dirgek jê vekir danî ser dawa xwe û dîsa bi awayê çûye, veqerîya cihê xwe. Berf piç û piç bir nava lêvên xwe û mijt. Lêvên wî wekî guzan bibire şewitîn. Nava wî kêmekî kizirî.

Taveke baranê ya bapeşkî, bi livandina ba re, ji jora Gelî ber bi jêrê ve herikî. Çend peşk hatin heta ber deriyê berizdeyê. Ba gihişt heta ber cawbaranka wî û laşê wî ricifand.

Derdor kêmeke din ronahî bû. Ewr li ezmanan her komî ser hev dibûn. Baranê dîsa hûr hûr dest bi barînê kiribû ku hevalê wî yê textor ji nava tehtên milê din ê berizde derket û hat. Xwe da bin berizdê û got:

- "Roj baş, tu hişyarî?"

- "Rast e. Ji te re jî roj baş. Tu çima bi şev winda bûyî?"

- "Min got bila cihê te teng nebe. Mirovê birîndar divê cihê wî fireh be. Ger mêşek li laşê wî bikeve, wekî hirçek pêlê bike, wiha pê zor tê. Ji bo wê ez derbasî milê din bûm. Li milê din kun gelek in. Te çawa kir? Şevê din te baş xew kir?"

- "Hingî ez betilîbûm, hema di xew re çûme. Ji xwe nizanim min çi xewn jî dîtiye, wiha bê hiş ketibûm."

- "Bi ser vî halî de, tu xewnan jî dibînî?"

- "Her şev. Carcaran bi roj jî dibînim. Nizanim ji hizrandinê ye, ji çi ye? Ji roja ez birîndar bûme heta îroj her gav, an xeyal, an xewn ji min kêmbûne. Rojekê jiyana kevn e, rojekê gerîlatî ye, rojekê zaroktî ye; ez ji ku dizanim; her car parçek ji jiyana min radibe ser lîngan û tê ber çavê min. Çi bi serê min hatiye, yek bi yek ez ji nû ve dijîm. Wekî mirov li xêr û gunehê xwe bipirse, wer li bêjingê dixim."

- "Baş e. Ma tu hîn çi dixwazî? Lêpîrsîna jiyana bi dest kê dikeve? Xêra xwedê ye."

- "Xêra kê be nizanim. Lê wekî mirov li ber mêzêna xêr û gunehan be; wiha li min hatiye. Ez her roj ji xwe dipirsim, dibêjim; 'Aha di vê demê de, min çima wiha kir, min çima ev şaşitî kir, min çima ev tişt bi ser nexist?' û di xewn û xeyala xwe de ya şaş radikim, a rast dixim

şûna wê. Wê çaxê jî ez pir li pêş dikevim, pir mezin dibim û herkes li dijî min radibe, serê min dikeve belayê.”

- “Dibêjin serê ku nêşe kundirek jê çêtir e.”

- “Rast e.”

- “Ê ka bêje wekî din, tu çi xewn û xeyalan dibînî?”

Hinekî hizirî û li hevalê xwe nêrî, got:

- “Dev ji xewn û xeyalên min berde, em li ser rastiyan biaxivin çêtir e. Heval doh nehatin. Ger îşev jî nêyên wê çawa be? Emê çi bikin?”

- “Wê îşev werin. Li kî derê bin wê werin. Doh ka xwedê dizane ji ber çi nehatin, lê îşev sedî sed wê werin. Ger ne wiha ba, ez tenê rênedikirim gel te. Ma ne dîn in, me her duyan li vê derê jibîr bikin, bihêlin!”

- “Xwedê dizane! Vê demê kes li kesî nafikire. Zikê têr hay ji yê birçî nîne!”

- “Em hemû zikbirçî ne; ma kî têr e? Ê me va ye hîn têra du danan hewdela me heye. Ez bawer nakim ku li nuqtê hebe. Niha li bin darên gozan, gozên nesitewiyayî bi kêrê vedikolin û tal tal dixwin – ku ew jî werin xwarin- wiha birçîbûna xwe diborînin.”

- “Ez bawer nakim goz niha werin xwarin.”

- “Ne ku tên xwarin. Xwepê mijûl kirin e. Yan na wê birçîbûna xwe bi çi rawestînin?”

- “Giya heye!”

- “Bê rûn, bê xwê, sê danan giya wê çawa bixwin? Vir jî hat girtin. Tenê berê xwe bidin zozanên Feraşînê ku bikaribin têr bixwin.”

- “Niha ew der jî tije heval in. Ma Feraşîn kê têr bike û kê têr neke?”

- “Ew e, wekî din çare nîne. Neyse, hîn ku baranê ne şidandiye ez biçim belkî ji bin tehtên jorê hin qirş û mirş kom bikim ku hewdelekê çêkim.”



- “Ku hebe hinek giya jî berhev bike.”

- “Bawer nakim hebe; hemû pîr bûye. Tenê piştî vê baranê dibe yê teze derkeve.”

Textor rabû ser xwe û li berzîdê zîvirî, ji ber çavan winda bû. Bêhn bi bêhn berên ji ber lingên wî dişemitîn, di dolika li kêleka berizdeyê re digindirîn.

Rahişt kîsikê tûtînê û cixareyek pêça. Dît ku tûtîn ber bi dawî ve diçe. Ji xwe re got:

- “Ger îşev heval neyên emê, dîsa vegerin sêra berê.”

Di ber xwe de kenîya û di dilê xwe de got:

- “Lale Dewrî bi dawî dibe.”

Ev her du-sê rojên ku textor hatiye gel, wekî ‘Lale Dewrî’ ya Osmaniyan dinirxand; di nava tinebûnê de hebûn jîyan dikir. Hewdel, goşt, savar, nan xwaribû û têr cixare kişandibû. Mirina wî dihat bîra wî, lê ev du-sê rojên dewlemend nedihatîn bîra wî. Lê niha ev jî bi dawî dibû; pir pir heta êvarî, her tiştên wana wê biqediyaba. Vê carê ji berfê jî dûr ketibû. Baş e ku textor li cem bû û dikarîbû biçe berfê bîne...

Dîsa kevir û zuxir gindirîn û pey re textor di kêleka berizdeyê re hat. Qeflek qirş u mirş kom kiribû. Bi rûniştinê re destê xwe avêt bêrîka xwe û baqek giha derxist, danî ber wî û got:

- “Zêde tinebû, tenê min evqas kom kir. Hinek sîrik û hinek tirşok e.”

Dema çav li giya ket, pir kefxweş bû; wekî dostekî xwe yê kevn dîtibe, dilê wî germ bû û ken di nava lêvên wî de çirisî. Bi rastî jî di van salên dawî de, ji pezekî bêhtir fêrî xwarina giya bibûn. Çi cureyê gihayê bihata xwarin, ji roja ji bin erdê derketina wê, heta pîrbûna wê divîbû bixwarana.

Ger ne wiha ba, nikarîbûn xwe li ser lingan bigirtana. Ên qîma xwe bi xwarina giya dianîn, li ber xwe didan, ên nedianîn direviyan û dev ji her tiştî berdidan. Ji bo wê carcaran henek li hevalên xwe dikir û digot:

- “Me qîma xwe bi guhreşka xav aniye!”

Ji ber ku gelek caran xwê û rûn peyde nedibû; digot; ‘Guhreşka xav’. Tenê di nava avê de dikelandin, digivaştin û wiha bê nan dixwarin. Bi rastî ne xweş bû, lê li ber dilê wî û wan ji kebabên dijmin xweştir bû. Dijmin gund tev vala kiribûn û ambargoya qût danîbû ser tevahiya gund û bajarên mane. Ji bo vê pêwîst bûn goştê laşê xwe jî bixwin, li ber xwe bidin û têkoşîna xwe bidomînin. Lê bi rastî ne hêsan bû û gelek kesên qîma xwe bi ewqas tengasî nedianîn direviyan, diçûn gel dijmin û li ser bêtêlê bang li wana dikirin, digotin:

- “Bi guhreşkê nava we peritî, werin gel dewletê nanê germ û şorbeyê bixwin.”

Keda ewqas salên xwe yên di şer de borandine, bi nanê germ û şorbeyê difrotin. Ji xwe piştî operasyona mezin a li Bestan, êdî fermandarên li ser yekîne û tabûran jî li hemberî tengasî û zahmetiyên gerîlan tengezar bûn û çare di revê de dîtîn. Duduyan ji wana qûtê yekineya xwe yê heye, tev tije çenteyên xwe kiribûn û gotibûn:

- “Emê jî we re biçin neçîrê!” Û çûbûn, di Başûrê welêt re derketibûn.

Yekîneya gerîla heta êvarî wiha bi zikê birçî li hêviya her du fermanbaran mabû ku ji wana re goştê nêçîrê bînin. Tenê êvarî têgihîştibûn ku fermandarên wana reviyane. Pişt re ew her du li

derdora gundên cerdewanan dîtibûn; ji şivanên cerdewanan nan û pêxwarinê xwestibûn. Pişt re jî bihîstibûn ku çûne Başûr. Gotibûn:

- “Me nedikarî bi zikê birçî şer bikin.”

Lê hîn bi hezaran gerîlan bi zikê birçî şer dikirin. Hêzên artêşa Tirkiyê her bêhnekê bi balefiran belavok û wenê diavêtin ser wargehên gerîlan. Di belavokan de, di derbarê zor û zahmetiyên gerîla dikişîne de dinivîsandin û banga teslîmbûnê dikirin. Wêne jî cûr bi cûr bûn. Wêneyê nanê somin, wêneyê keçên teslîmbûyî li hewşa qereqolê ku li ser kursiyan ling avêtine ser ling...

Dema ev wêne didîtin, bi halê wana dikeniya û digot:

- “Kî, kê dixapîne!?”

Dizanîbû, ku rehetiya di wan wêneyan de, tenê wê dema wenekişandinê dihat jiyandin; piştî wê dîsa leşkerên Tirk li wan siwar dibûn. Ji xwe carekê keçek reviyabû û di bêtêlê de bang li keçên gerîla kiribû, gotibû:

- “Ez hatim vir, bi pîrekiya xwe hisiyam! Hûn jî werin teslim bibin, bi tama jiyanê bihisin, pîrekiya xwe bizanibin!”

Yekê din jî gotibû:

- “Di nava gerîlan de zilam tinebûn, ez ji bo wê reviyam.”

Gerîlayên di bêtêlê de li wê guhdarî kiribûn, ji wê re gotibûn:

- “Qehpe!” û wekî din ti bersiv nedabûnê.

Dizanîbûn ku ew niha di bin polîs û leşkerên wekî keran de, bi awayekî keritî xweajoyên xwe yên zayendî bi cih tînin û ji bo sêniyeke xwarin, pakêteke cixare, şûşeyekî kola xwe difroşin. Şaş diman ku mirovên evqasî lawaz û ketî, bi salan çawa di nava xwe de dane jiyandin!? Hinekan digot:

- “Dema firehî bû, her kes şêr bû, lê niha dema guhreshkê ye; her kes guhê xwe dihejîne!”

Du-sê ta giya paqij kir û avêt devê xwe. Mizbûna tirşokê careke din li ser zimanê xwe bihîst. Wekî mizbûna tûtina Ewrex, hênkahiyekê xwe da nava dilê wî. Belê di van sê salên dawî de, ew û giya bibûn dostên hev ên heta axîretê.

Hevalê wî agir pêxistibû û sênî danîbû ser. Bêhna arê kizirî wekî bêhna qehweya çolistanê hat bêvila wî. Bêhn kişand nava xwe û du serî sîrik jêkir, avêt devê xwe. Tûjbûna sîrikê kêlekên zimanê wî şewitandin. Ji xwe re got: 'Wey, sîrika eslî ye!'

Ji bo tûjbûnê bikuje, du-sê ta tirşok bi ser de xwar û biryar da ku giyayê maye, bi hewdelê re bixwe. Giha danî kêlekê û li hêviya pijandina xwarinê rawestiya.

Baranê hêdî bi hêdî dişidand, lê ba hîn nerawestiyabû. Textor got:

- "Ezê hewdeleke wiha çêkim ku te li mala bavê xwe jî nexwaribe!"  
û pê re keniya. Pişt re rahişt dirgeg berf û berda ser arê qemirandî.

- "Min ji xwe li mala bavê xwe hewdel nexwariye. Ma kê li mala bavê xwe hewdel dixwar? Ji xwe qet me nizanîbû tama wê çawa ye!?"

- "Min dizanîbû."

- "Qey we li malê çêdikir?"

- "Dema pez nexweş diket, dayika min çêdikir ku nava pezî pê rehet bibe. Wê demê ez zarok bûm û li ser giriyabûm. Dayika min hingî kevçiyek xistîbû devê min û dev û lêvên min tev şewitîbûn. Ji xwe careke din jî min ji dayika xwe hewdel nexwest."

- "Xuya ye dayika te bi hiş bû. Wer kiriyê ku tu beleya xwe jê vekî."

Textor dirgeg berfa din avêt sênîyê û bi ken bersiv da, got:

- "Na wele ez yekî nerehet bûm. Dayika min digot ku, ji bo min ji şîr veke jî, îsota tûj di serê memikên xwe dabû. Dema min şîr xwestibû û memik xistibû devê min, min qîr dabû û reviyabûm; ez wiha ji şîr

qut bibûm. Dayika min zeyif bû û şîrê wê kêmbû. Lê digot: 'Te qasî golikekî şîr dimijt'.

Textor bi gotina xwe kenîya û hevalê wî jî tev li kenê wî bû. Êdî hewdela wana jî amade bû, lê ji bo ku wekî zaroktiya textor devê wan neşewite, divîbûn hinekî li hêviyê rawestiyana.

Textor sênî ji ser tifikê danî û qirşikên mane vemirandin ku êvarî jî ji bo hewdela dawî bikar bîne. Dema sênî danî erdê got:

- "Min bi zanabûn kêmekî rohn çêkir ku ya êvarî tîr be. Emê êvarî hişyar bimînin, ta ku heval werin. Ji bo em birçî nebin, divê hinekî tîr be. Ma ne baş e.

- "Qet ferq nake, çi keçel, çi gûrî, her dû jî tê wateya bêporbûne. Hewdela rohn jî, ya tîr jî her hewdel e, her ar û av e. Te negot ku tîr be, wê wîtamîn û proteîn tê de be!"

- "Na, lê dîsa jî tîr tîr e û rohn rohn e."

- "Rast e. Lê li gorî min dîsa jî ferq nake. Ev sê sal in, halê me her halê helawçiyane."

- "Ki dizane belkî heval êvarî bîn, hinek goşt bi xwe re bînin."

- "Serşivan zanibe em li vir in, wê goşt rêke wele. Lê kî dizane niha ew li ku ye?"

Textor rahişt sênîya hewdelê û danî navbera xwe û hevalê xwe. Du kevçî jî sipartin sênîyê û got:

- "De, em destpê bikin."

Her du heval wekî mirov fêkî biqêşere, bi serê kevçiyên xwe tûyê di ser re kom bûye qeşartin û birin devê xwe. Her duyan jî ji tecrûbeyên xwe dizanîbûn ku kevçiyên wan kêmekî kûrtir biçin, wê bigihên cihê germ û vala vala devê xwe bişewîtin. Ji bo vê heta hewdel di sênîyê de bi dawî bû, her wiha tûyê di ser re kom dibû

xwarin. Hîn du-sê kevçî bi binê sêniyê ve mabûn kevçiyê xwe danî erdê û got:

- "Hevalê textor destê te sax be. Bi rastî te pir xweş çêkiribû."

- "Te tiştêk nexwar, dewamke."

- "Min bes e."

Zîvirî kêleka xwe ku rahêje kîsikê tûtînê û di wê bêhnê de çavên wî li sîrik û tirşok a li kêleka wî ket. Hişê wî nû hat serê wî û got:

- "Xwelî li serê me be. Ne hiş maye, ne aqil. Yanî min gotibû, 'emê bi hewdelê re bixwin', lê min jibîr kir. Qet aqil nemaye. Jite, qet nebe bi yê binê sêniyê re bixwe."

- "Dev jê berde. Ji xwe tev du-sê ta ne. Wê jî biavêje devê xwe bila biçe."

Sîrik li hev pêçan û xist nav pelên tirşokê û tev kir gepek mezin û cût. Textor jî bi kêleka kevçî sênî ji hewdelê paqij kir ku êdî hewceyê şuştinê jî nedikir. Her du kevçî avêtin hundirê sêniyê; sênî danî kêlekekê û got:

- "Her ku diçe baran dişidîne, ya baş ezê biçim razê. Ger nîvro dinyaya veke, ezê bêm birîna te pansûman bikim. An na bila bimîne esir."

- "Ma derman maye?"

- "Di binê şûşe de çî mabe ew e. Belkî nemabe jî. Lê dîsa jî em birînê paqijkin baştir e."

- "Tu dizanî. Biçe xwe rehetke. Ger dinyaya veke, ezê bang li te bikim."

- "Qet xwe newestîne; dengê te nayê min. Ji ber ku cihê min li derdora tehtê dizîvire."

- "Kêfa te dizane. Wê çaxê ezê jî xew bikim."

Textor rahişt çeka xwe û di dolikê re bi jorê ket. Ew dîsa ma bi tena xwe. Bi serê zimanê xwe li navbera diranên xwe xebitî û parçeyên

giyayên ketine ber diranên xwe, xwest derbixe. Demekê wiha xwe bi vî karî mijûl kir. Pişt re hat bîra wî ku piştî xwarinê cixare nevexwariye. Rahîşt kîse tûtînê û pelek jê derxist. Bi serê her du tiliyên xwe rahîşt kêmek tûtînê û li nava pelê rast kir. Pel li hev bada. Bi serê zimanê xwe kêleka rabûyî şil kir û bê ku ji hev veke li hevûdu pêça. Binê wê bi ser hev ve givaşt û kêlekên serê wê bi hundir ve tewand. Pişt re bi nava lêvên xwe. Hesteyê xwe derxist û pêxist. Dûsê hilmên kin li ser hev kişandin ku baş pêkeve. Serê çixarê sor bû şûn re, hilmêke kûr kişand û dûman bir heta kûrahiya kezeba xwe. Pişt re hêdî hêdî berda der ve...

Baran hîn peşko peşko dibariya. Ezman wiha tije bû ku mirov digot, 'de wê vê bêhnê xwe vala bike, de bêhneke din'. Dema hilma kûr a cixareyê berda der ve, serê xwe paş de dabû û awirên wî li ewrên daketibûn berpâlên çiyê ketibû. Di ber xwe de got:

- "Çi rojeke tevlihev!"

Hilmêke din kişand û li ser rewşa rojê nêrînên xwe anîn ber çavên xwe û bi xwe bi xwe re ket nava gotûbêjê:

- "Li gorî ewr evqasî daketine erdê, divê êdî bes bibare."

- "Çima? Berûvajî wê, ev nîşan dide ku êdî li ezmanan rêka ewran nemaye û xwe direjî erdê kirine."

- "Na lo. Dema dinya germ dibe, ewr fireh dibin û xwe berdidin erdê."

- "Belê ji bo wê kabên te diricifin û şerqe şerqa diranên te ne. Madem dinya germ e, rabe cilê xwe ji xwe bike!"

- "Ne ewqasî jî. Lê ku baran zêde nabare, ji van ewran e."

- "Ji çî dibe bila bibe. Ji xwe ev hewa ya 'bûnalimê' ye. Yan bila têr bibare xwe vala bike, yan jî bila raweste. Çi ye, wiha wekî zarokê mizmizokî; wiha mad-tirş, wiha peşko peşko..."

- “Şevê din xweş bû mesela. Têr xwe vala kir û pişt re, bêhna xwe veda.”

- “Lê niha...”

Cixareya wî gihiştibû dawî. Dema navbera tiliyên wî şewitî, pê hisiya ku cixara wî, bi dawî bûye. Awirên xwe ji nava mijê kişandin û hişê xwe anî serê xwe, ji xwe re got:

- “Ez çiqasî dikarim li ser tiştên vala bifikirim. Dîsa min tamedek ji cixarê nekir. Tu dixwazî bila bibare, tu dixwazî bila nebare; ne ti pezê bavê min li ber baranê maye, ne jî cotê min heye ku ez biçim bikim. Xwedê bike sed salên din jî wiha bibare û qet veneke. Ma ya min çi ye?

Wê carê zor da xwe ku hizra xwe bi xwe bersiv neke. Dizanîbû ku di hewayên wiha girtî û nediyar de giyana mirov jî dihat givaştin û diket nava hewildanên nediyar. Ji bo wê mizeke dawî ji dûvikê cixarê kişand û piça maye avêt kêlekê. Pişt re kefî û cawbarank kişand ser serê xwe û wiha bê ku xwe dirêj bike, di cihê xwe yê rûniştî de, çavên xwe birin ser hevûdu. Bêhnek neket navberê, bi rastî ji di xew re çûbû.

Çiqasî di xew de mabû nizanîbû; ji ber ku dema biryara xewkirinê dabû li saeta xwe nenêrî bû. Le xuya ye ku zêde nerazabû. Tenê bi germbûna laşê xwe hisiyabû û ji xew veciniqîbû. Li derdora xwe nêrîbû û çavên wî li deqên rojê ketibû. Ecêb e! Baran rawestiyabû û niha ji erdê hilm radibû. Lê ezman hîn tije ewr bû û bayekî nerme dîsa ew dabûn ber xwe û bi ber zozanan ve didehfandin. Li saeta xwe nêrî. Hîn deh û nîv bû. Ger ne şaş be ev sê çarîk, an jî saetek e di xew de bû. Lê belkî saetûnîvek jî hebû. Saet heyştê sibehê textor ji xew rabibû û hatibû cem. Lê çêkirina xwarinê û xwarina wan çiqas



dem girtibû, tam nizanîbû. Bila ew jî saetek girtibe. Kişandina cixareyekê jî çarîkek...

- “Dîsa tiştên vala! Saetek be çi ye, deh saet bin çi ye? Her ez li vir im û her di cihê xwe de rûniştîme. Çi hişyar, çi di xew de qet ferq nake. Ya grîng ew e ku dem derbas bibe! Lê xuya ye ku hîn ji nîvro re gelek heye û ger ez hişyarbim, tûtina maye jî ezê bi dawî bikim; ger ez binivim, qet nebe êvarî heta heval bên, ezê bikaribim têr cixarê vexwim û him wê sebra min were, him jî nakevim xew. A baş ev e.”

Êdî biryara xwe ji bo rojê da. Çiqasî dilê wî diçû cixareyekê jî kurme xwe rawestand û careke din kefi û cawbarank kişandin ser sere xwe. Lê vê carê laşê wî têra xwe germ bibû û lingê xwe yê saxlem dirêj kir.

Bêhneke din dilê wî bijiyayê ku xwe bi tevahî dirêj bike. Rabû ser xwe kefi û cawbarank da aliyekî. Bi her du destên xwe rahişt lingê xwe ye birîndar û dirêj kir. Pal da piştta xwe; dît ku sere wî hîn tê ser tehtê û nayê ser çente. Hinekî din laşê xwe pêş de da û lingê xwe yê birîndar dîsa rahiştîyê û pêş ve bir. Dîsa pal da. Vê carê serê wî tam dihat ser çente.

Rahişt kefiya xwe û guhekî wê xist bin pehniya lingê xwe yê saxlem, guhê din —ê çepûrastê wê— kişand heta ber qirika xwe. Her du guhên din xistin bin kamaxa xwe ku serma di ber re negihêje laşê wî. Pişt re rahişt cawbarankê û ji binê lingê xwe heta ber qirika xwe kişand. Guhikên kêlekên wê jî xistin bin rehn û piştta xwe û xwe dirêj kir. Serê xwe danî ser çente û li ezmên nêrî. Ewr ketibûn pêşbirka bazdanê. Komên ewran ên cûr be cûr, yek pey yek û li kêlekên hevûdu rêz bibûn. Ji navsera Kêlê xwe berdidan ser Gelî û berê xwe

didan Rojhilat, ber bi zozanên Botanê ve diherikîn. Kî dizane, belkî heta Çiyayê Agirî jî biçûna!

Carcaran parçeyek ji ezmên xuya dikir; tîrêjên rojê ronahiya xwe tê re didan beralpên Kêlê; lê lehiya ewran zû dihat û ew kun dadigirt. Lê bêhneke din li cihekî din kuneke din vedibû û roja germ tîrêjên ronî di wir re digihandin xaka şilbûyî û pê re wekî ava bikele, hilm ji erdê bilind dibû.

Li ve leyîstika ewr, roj û erdê çiqasî temaşe kir nizanîbû. Lê carekê pê hisiya ku xwêhdan bi laşê wî ketiye û goştê laşê wî tev nerm bûye. Wê demê bê hemdê xwe be jî kefî kişand serê xwe û mijankên wî xwe li hevûdu pêçan. Ji bo wê, heta hevalê wî yê textor ji jore xwe berneda û nehat ber serê wî û deng lê nekir, bi xwe nehisiya û her di xew de ma.

Dema bi dengê textor hişyar bû, raste rast li saeta xwe nêrî û dît ku nêzî dudyan dibe. Şaş ma bê çawa evqasî dirêj xew kiriye! Lê hîn laşê wî germ û di nava xwêdhanê de bû. Bes hişê wî jî hîn nehatibû serê wî. Di ber, xwe de hizirî ku çima vê carê xewn nedîtine. Wiha xilmaş xilmaş difikirî ku textor got:

- “Ka rabe kêmek dermanê maye jî em li birîna te bidin ku êvarî heval werin, tu bikaribî rehet biçî.”

Wê demê keniya û tam ji xew hişyar bû, got:

- “Tu her gav wiha dibêjî, lê qet heval nayên. Ez ditirsim ku îşev jî neyên.”

- “Çima?”

- “Nizanim, hema, dilê min wiha dibêje. Qet ti heyecan naye min. Ji bo wê ez dibêjim ku heval nayên.”

- “Tu jî tam wekî eshaban diaxivî. Ger li gorî dilê te tişt çêbibana, wê demê tu birîndar nedibû û niha ez û tu jî li vê derê nedibûn. Tu qet

xemê nexwe; heval li ku derê bin, wê îşev werin. Ew dizanin ku ne derman, ne xwarin li cem me namîne. Ma ne dîn in me wiha bihêlin û neyên!?”

- “Ez nizam. Min got ya, dilê min wiha dibêje.”

- “Dev ji dilê xwe berde. Ka tu rabe ser xwe, ez pansûmanê bikim û pişt re em xwarina dawî bixwin; çi dibe bila bibe.”

Textor ji çenteyê xwe şûşeyê tenturdiyotê, meqes û paçê pêçanê derxist. Wî jî kefi û cawbarank ji ser laşê xwe avêt û dest bi vekirina lingê xwe kir.

Piştî pansûmanê bi xwe hisiya ku laşê wî hinekî rehet bû û hênkahiyeke li ser birîna xwe bihîst. Êdî wî ji dixwest ku ji hatina hevalan hêvîdar be.

\*\*\*

## BÎST

Êvar, di nava bêdengiyê de hat. Êdî ji Girê Darikê Kerkolê –Girê ku dijmin li ser bû- filitî bû bibû; zîvironeka gelî diket ber û xuya nedikir. Ne tene xuya nedikir, ji ber zîvironekê dengê jeneratora dijmin jî nedihat. Lê texmîn dikir ku dakeve nivê dolê wê dîsa bikeve pêşberê girê dijmin li ser bû. Bes li gorî nikarîbû, daketa wê demê êdî ne çavên wî li gir diket, ne jî deng dihat guhê wî. Ji aliyekî ve ev çend roj bûn dengê jeneratorê ji bo wî bibû wekî sînyala destpêka şevê û dema deng dihat guhê wî, xwe bêhtir ewle didît –ji ber ku dizanîbû dijmin li derdora jeneratorê ye û ber bi wî ve nayê. Lê car caran wiha dihizirî ku dijmin çiqasî li derdora jeneratorê be jî, ewqasî dikarîbû hêza xwe rêbike derve jî. Bes dîsa jî ji bêdengiya kerr û lal a giştîya rojê baştir didît û xwe rehetir dibihîst. Ji ber vê yekê, di êvara yekemîn a nehatina dengê jeneratorê de, xwe di nava

valahiyekê de bihîst û pê ecêb hat. Belkî ji bêdengiya ezmên bêhtir, vê yekê ev valahî xurt kiribû. Êdî ne gire gira ewran mabû, ne şerqe şerqa birûskan. Wekî dinya westiyabe û dest bi bêhnvedanê kiribe, her tiştê rojê betal bibû. Baran jî rawestiyabû û ba jî nediliviya. Ne ev tenê, xweza bi xwe jî bêdeng bibû.

- “Tu dibê qey xwezayê zimanê xwe daqurtandiyê! Bêdengî bi te ecêb nayê?”

- “Rojên biharê ne; geh ba û bahoz e, geh tav û roj e! Ti ecêbiya xwe nîne.”

Piştî vê bersivê di navbera her du hevalan de jî bêdengiyê destpê kir. Êdî her ku diçû hevûdu jî nedidîtin. Siya ketibû ser gelî ber bi tarîbûnê ve diçû û li parçeyê ezmanê xuya dikir, libo libo stêrkan xwe nîşan didan. Lê ronahiya wan belave bû û ne zêde ronî bûn. Kêmekî fikirî ku ji ber çî wiha ne! Lê zû hat bîra wî û bi hişê xwe kenîya. Destê xwe avêt bêrika xwe; berçavka xwe derxist û da ber çavên xwe. Stêrk di ezmên de pêş ve hatin û ronahiya xwe komî nava xwe kirin, bêhtir biriqîn. Nû têgihîşt ku gelek stêrkên din ên hîn bêhtir li dûr jî derketine. Berçavka xwe ji ber çavên xwe kir û dîsa xist bêrika xwe. Li ser bersiva hevalê xwe yê Textor dest bi hizirandinê kir. Xwe bi xwe re, di hundirê xwe de axift.

- “Belê Bihar e, lê Bihar ti caran bêdeng nabe.”

- “Çima nabe? Piştî firtoneyan herdem bêdengî ye.”

- “Ew berya firtoneyan e; ne piştî wan!”

- “Çi ferq dîke?”

Xwest vê pirsê ji textor bike. Lê êdî tenê reşahiya wî xuya dikir, rûyê wî ne diyar bû. Gelo dixwest biaxive yan na? Xwedê dizane niha di aqilê wî re çî derbas dibû? Feqîro, niha ji xwe dipirsî ku çî karê wî li vir heye. Wê şevê hevalan ew ji bo çî tenê rekiribûn, hîn aqilê wî jê

ne digirt. Gelo nikaribûn ew bi xwe jî bihatana jêrê û ew bi xwe re bibrana. Wê çaxê hewce nedikir van sê-çar rojên xwe li ber keviya berfê birçî derbas bikrana. Her çiqasî zêde birçî nebibûn, lê va ye her tişt bi dawî bibû. Ger îşev jî heval nehatibana, êdî pêwîst bû zikê xwe bigivaştana. Ew ji xwe fêr bibû lê feqîrê Textor wê çima xwe tev li qedera wî kiribaya?

Xwest vana ji devê textor bibihîse yan pê re gotûbêj bike. Gelo ev tiştên dihatin hişê wî, di hişê Textor de jî, li hev diketin? Bi rastî, Textor niha çî dihizirî? Hemû wêra xwe da xwe û pirs kir:

- “Textor!?”

- “Hiii?”

Dengekî wiha sist û bê xem ji devê textor derketibû ku yan çav li xewê bû, yan jî hişê wî çûbû derveyê Gelî. Ji bo wê nexwest dirêj bike û got:

- “Tu dixwazî biçe xwe dirêj bike; dema heval bên, ezê bang li te bikim. Ez dikarim hişyar bimînim.”

Textor wekî li hêviya vê peyvê bû, di cih de rabû ser xwe û got:

- “Baş e. Bes tu bang li min bikî, dengê te nayê, tenê tu hevlekî rêkî jorê, bila ew bang bike.”

Bêhnekê rawestiya û gotina xwe domand:

- “Lê heta wê demê ezê ji ber xwe ve hişyar bibim. Ez ditirsim ew bi jêrê ve biçin cihê te yê kevin. Ji bo wê divê yek ji me herdem hişyar be.”

- “Tu biçe, ezê hişyar bimînim.”

Textor got:

- “Temam,” û reşahiya wî ji ber çavan winda bû. Heta li derdora tehtê zîvirî, dengê lingên wî hat û pişt re jî dengê berên ji ber lingên wî gindirîn domiya. Dema deng bi tevahî bi dawî bû; ew dîsa bi tena

xwe ma. Destê xwe li kêleka xwe peland û rahişt kîsikê tûtinê. Tiliyên xwe li hundirê kîs peland û koşeyên wê vepexirand. Her piça tûtina hat ber tiliyên wî li koşeyekê da ser hev. Pişt re pelek ji desteyê veqetand û bi serê tiliyên xwe tûtina daye ser hev, rahiştîyê û li ser rûpela kaxezê kom kir. Dema baweriya wî rûnişt ku di binê kîs de êdî qet tûtin nemaye, kîs danî ser dawa xwe û dest bi pêçana pelê kir. Dawî cixareyek qasî teriya mişkekî sitûr derket holê. Dilekî wî digot:

- “Çi mafê te heye tu jê bixwazî? Ma Textor tûtina heye li xwe û te nîve nîv parve nekir?”

Cixareya pêçaye, bir nava lêvên xwe. Hesteyê xwe derxist û di bin kefiyê de pêxist. Him ji ber fêrbûne û him jî digot: ‘Dibe ku hinek li derdorê hebin’. Her dem wiha cixareya xwe bi awayekî veşartî pêdixist. Tenê şevê din wiha hatibû ber dilê wî ku carekê eşkere pêxe, lê pişt re ji wê pêxistina eşkere jî poşman bibû. Baş dizanîbû ku di şevên reş de agirê cixareyê û agirê heste ji kîlometreyan dûr ve jî diyar dibû. Ji xwe ev bi serê wî jî hatibû.

Dema ji Mêrdînê derbasî Botanê bibûn; li ber Ava Mezin, li wî milî avê; li navsera çiyayên dixwestin bi ber ve biçin, leşkerekî dijmin (an jî cerdewanekî) hesteyê xwe pêxistibû; ronahiya vî hesteyî dîtibûn û têgihiştibûn ku li wî milê avê operasyon heye! Bi vi awahî li milê din ê avê rêka xwe nedomandibûn û xwe di bin zinarekî bilind de veşartibûn. Bi vê tedbîrê jî ji operasyonê filitîbûn. Ji ber vê yekê, herdem ew gav dianî bîra xwe û cixareya xwe –li ku derê dibe bila bibe- di binê kefiya xwe de pêdixist. Dema kefi ne li cem ba, her du kabên xwe didan erdê, serê xwe nêzî erdê dikir û di kefa destê xwe de pêdixist. Lê ku cihekî ne ewleyî baya qet wiha ne dikir û ji hevlekî xwe kefiya wî dixwest, an jî cixareya hevalê xwe –ku pê

xistibe- dixwest û bi wî awahî cixareya xwe pêdixist. Lê herdem û li her cihî hemû gerîlan ev rêzik wekî wî pêk nedianîn. Cihên ku gerîla zanîba xetariya dîtina dijmin nîne, yan kê m e, bêhtir di kefa destên xwe de , yan jî di nava şeqê xwe de pêdixistin û wê demê jî sedî sed agirê wan çirûsk didan der. Dema zedê çirûsk derdiketin jî hinekên xwe berpirsyar didîtin, hevalên xwe bi xeyd hişyar dikirin û digotin: - “Bi dizî pêxin, em nizanin çi li derdorê heye.”

Lê gerîlayên ku çirûsk dabûn der, di dilê xwe de digotin:

- “Em dizanin, tiştê nîne!” Ê mizek dirêj ji cixareya xwe dikişandin. Baş bû ku yê wiha digotin jî cixareya xwe ne eşkere, di kefa destên xwe de dikişandin.

Du-sê hilm li ser hev ji cixareya xwe kişand û heste xist bêrîka xwe. Bi wê bêhnê re bêdengiya şevê xera bû. Ji latên jorê yê milê Dola Şuminiyê çend kevirên mezin li ser hev gindirîn û xuşiniyek bi gelî ket. Guhên xwe bel kirin û dan ser xuşiniyê. Têgihişt ku kêşiyê mezin kevir, teht –belki ax jî pê re- ji cihekî vebibû û bi xwarê ve herikîbû. Barana hatî –dibe ku- ax sist kiribû û ji bin kevirê; yan tehtê hilandibû. Teht an kevir jî heta niha li ber xwe dabû, lê tam di vê bêhnê de êdî giraniya wê, zora wê biribû û ew jî gindirîbû. Dema gindirîbû kuç û berên hûr û mûrên li derdora xwe û jora xwe jî bi xwe re daxistibûn û dawî yan li berekî mezin an jî li dolikekê rawestiyabû.

Bi rastî jî wekî wiha bibû, bi dengê herikîna re dîmenê wê, anîbû ber çavê xwe. Di vê anîna ber çav de jî, qet zahmetî nekişandibû. Ji ber ku dizanîbû baran –an lehî- axê çawa sist dike û ji bin kuç û beran vedikişîne.

Carekê berekî mezin wiha gindiribû ser mangeya wan, li ser sobeyê ketibû û agir bi mangeyê xistibû. Lê ew bi xwe wê demê ne li

mangeyê bû. Ji bo karekî çûbû cihekî din û li wir bihîstibû ku kevir bi ser manga wan de gindiriye û agir pêketiye. Di vegerê de, hevalên wî yên mangê jê re gotibûn ku bi kotekî ji mirinê filitîne û ew cih ji bo mangeyê nabe. Lê di dolê de derveyî wir jî cih nemabû. Ji xwe ew jî li ser mangeyên din belav bibûn. Lê wiha jî kar nedimeşiya. Dawî serê xwe li ber qedera xwe tewandibûn û dîsa vegeyabûn cihê xwe. Destpêkê manga xwe paqij kirin. Ax û herî û berên tê de avêtin der ve. Ji ber ku naylona ser peritî û şewitîbû, hundir tije berf bibû û binê mangê av kişandibû. Ji bo wê erd baş xeritandin û çûn hundirê tunelan –ji sedema hebûna van tunelan li wê dolê dimansê-çar kîs tije axa ziwa anîn, li binê mangê raxistin û ser dar û naylon kirin. Sobeya xwe rast kirin û ji nû ve dadan. Heta destpêka biharê jî ti kuç û ber û qeda bi ser wana de nehatibûn. Lê dema bû bihar û berfê dest bi hilandinê kir, av rabûn û ji her milî ve xwe berdan ser dolê. Şelaleya di ser tunelan re –ku berê qasî mîza hêstirekê av tê re dadiket û ew jî sibehan diqerisî, tenê piştî nîvro diherikî- êdî dol tije dikir û pêla wê ji tehtê ne kêmi deh gavan dûr ve diçû. Ji bayê peşkên wê kesî nikaribû xwe nêzikê bikraya. Bi ser wî halî de, şevêkê pir baran bariya û gihişt heta dîwarê mangê. Heta sibehê li ber diwêr nobet girtin, lê tiştê ji destê wana nedihat. Bi ber destê sibehê re, rêza diwêr a ber devê derî li ber lehiyê çû. Lê baş bû ku lehî zêdetir bilind nebû û dîwar bi tevahî li ber xwe nebir.

Wê salê tofana zivistanê bi wî awahî derbas kiribûn. Êdî ew jî jê re bibû ders û dema dibû payîz ku dest bi çêkirina cihê xwe yên zivistanê dikirin; heta ji dest dihat, bi xwe li cihê mangê digeriya û ev felaketên bi serê wî hatine, didan ber çev û wiha hildibijart. Lê carcaran jî ji ber tengbûna dolan, an jî derenghatina xwe, didît ku cihê maye çawa be divê qîma xwe pê bîne û dengê xwe neke.



Carcaran jî didît ku birastî cihekî pir xweş para manga wî ketiye û bi vê yekê jî kefxweş dibû, dîsa xwe bê deng dikir.

Cixareya wî dîsa di nava tiliyên wî de bi dawî bibû û bi şewata tiliyên xwe hat ser hişê xwe. Dîsa bîranînên wî bibû sedem ku tamekê ji cixareya xwe ya dawî jî neke. Bi sere tiliyên xwe bi binê binkê cixareye girt û bi serê lêvên xwe hilmeke dawî bi kotekî kişand. Bêhneke germ li ser lêva xwe ya jorê bihîst. Dûvik avêt nava reşahiyê. Dûman kişand nava xwe û hêdî bi hêdî derxist der ve. Êdî tûtin jî bi dawî bibû! Niha tenê hêviya wî hatina hevalên wî bû. Lê gelo wê tûtin bi xwe re anîbana!?

Li gorî gotina textor niha bê nan, bê xwarin û bê tûtin bûn. Lê ew wiha dihizirî ku niha ji xwe re ji cihekî hinek qût peyde kirine. Êdî dizanîbû ku hebûn û tinebûn wekî goşt û hestî bi hev re dijiyan. Zikek têr zikêk birçî! Yan jî rojek têr, deh roj birçî! Carcaran jî mehekê têr, deh mehan birçî!

Gelo birçîbûn qeder bû? Ji milekî ve, 'Erê'; ji milekî ve. 'Na'. Di vî alî de carcaran tawan dikir ê dijmin, carcaran dikir ê gerîlan û bi xwe re diket nava devjengiyeye dijwar:

- "Ma feqîrê gerîlan çi bikin; dijmin her der vala kir."

- "Bila ew jî biçe cihê tije. Ka ji gundan wê daketa bajaran? Niha dêr jî çû, mizgeft jî çûn."

- "Ew ne sûcê gerîlan e, sûcê dijminan e. Ger di sala 92an de, piştgiriya dijmin nekiribana, niha Kurdistan ji mêj ve rizgar bibû!"

- "Rizgar biba jî, wê dîsa bi destê xwe hilweşandibana."

- "Xwezî Tirk tenê li hemberî gerîlan bana, te yê bidîta çawa di Enqerê re derdiketin! Lê çi bikim dinya tev li piştê ye!"

- “Ji xwe dinya naxwaze em Kurdistanê rizgar bikin; ji ber ku berjewendiya wan ne di hebûna Kurdistanê de, di tinebûna Kurdistanê de heye. Ew jî naxwazin berjewendiya xwe xera bikin.”

Dema devjengî û ramanên wî dihatin vê xalê, avahiyeke zêdeyî sed taqî ku her taqek wekî kevirên çar koşe yên leyîstokên zarokan bikaribin li ser hevûdu lê bibin, dihat ber çavên wî. Her keviyek dibû taqek û her taqek navê dewletekê li ser bû. Him di ber xwe de dikeniya û him yek bi yek li lêkirina keviran temaşe dikir. Kenê wî bi vê şibandinê hat...

Li gorî vê yekê; di taqa tewra binî de –ango kevirê yekemîn- Tirkiyê hebû. Li ser wê Îraq, li ser wê Îran, li ser Îran jî Sûriye. Pişt re bi rêzê dewletên Ewropa, dewleta Rûsya, Çîn, Japonya, yên bi Tirkiyê re têkiliyan wan hene dihatin. Dawî dewleta Elmanya, Brîtanya û li ser tevan jî Amerîka dihat.

Ji ber ku Amerîka li taqa tewra jorê bû, dema erd dihejîya ji Tirkiyê û her sê dewletên din ên di ser re bêhtir dilerizî û bi vê sedemê zor dida Tirkiyê ku erdhejê rawestîne. Tirkiyê destpêkê digot:

- “Bingehê min saxlem e.”

Lê bingehê avahiya xwe li ser gora Kurdan danîbû. Di dil wî de Kurd miribûn û erda gorê bi Tirkan mabû. Ji bo wê, bi dilekî rehet avahiya xwe –yanî komara xwe- li ser ava kiribû. Lê piştî vê avakirinê pêncî salî şûn re, di gorê de livandinek pêk hatibû û roj bi roj ev livandin bêhtir û xurtir bibû...

Her dem gava li ser rewşa Kurdistanê û ya cîhanê dihizirî, ev avahiyên wekî qutîkan li ser hevûdu dianîn ber çavê xwe û dizanîbû ku Kurdistana di binê axê de dilebite û pê re hemû taq dihejin dikin hilweşin û bi halê wana jî di ber xwe de dikeniya û digot:

- “Ji bo vê bê guman naxwazin Kurdistan ava bibe.”

Pişt re zor û zahmetiya avabûna Kurdistanê dianî ber çavên xwe. Bê guman ji bo vê avabûnê divîbû hemû taq hilweşiyana, ax hatiba kolandin, Kurdistan derketiba ruyê erdê; taqek jî ji bo wê hatiba avakirin û ji nû ve herkesî taqa xwe li gorî vê rewşa nû ava bikraya. Kê rê dida ku ji bo avabûna welatekî, berjewendî û avahiya li ser vê tevî hilweşîne û ji nû ve li gorî welatê nû hatiye avakirin lêbike? Heta ev zor û zahmetî bidana xwe, bi rehetî wê bigotana; 'Bipelixînin ku ji binê erdê dernekeve!' Û ji xwe tiştê rayedarên dewletên cîhanê ji bo kurdan rewa didîtin jî ev yek bû!

Dîsa ji berpâlên jorê kevir û zixur hilweşiyên û ew careke din ji ramanên wî dûr xistin. Guhê xwe da ser dengê hilweşînê. Vê carê zêde neajot. Kî dizane belkî çend kevir ji ber lingê heywanekê gindirîbûn. Pê re dîsa bêdengî ket ser Gelî. Bala xwe da ezmên. Stêrkan tev xwe veşartibûn. Gelo çavên wî nedidîtin. Berçavka xwe derxist û da ber çavên xwe. Wiha li ezmên nêrî. Bi rastî jî stêrk tev wî bibûn. Têgihîşt ku dîsa ewrên tarî dane pey hev. Berçavka xwe dîsa xist cihê wê û vê carê li saeta xwe nêrî. Deh û deh. Tam dema hatina hevalên wî bû.

Kêmek bayê sar ji jora gelî, xwe di ser berfê re bera jêrê da û baskên wê, berfirehiya berizdeyê alastin. Tezînokeke demkin bi laşê wî ket. Wekî ezraîl di ber re derbas bibe, laşê wî bi carekê re ricifî. –Di biçûktiyê de, dema laşê wî wiha direilî, dayika wî digot ku, 'Dema ezraîl di ber mirov re derbas dibe, laş wiha diricife!' û ji bo ku mirin di ser re qeviziye sedqe dida.-

Bêhneke din pêlek bayê din ê sar bi jêrê ve herikî. Vê carê laşê wî nericifî, ji ber ku laşê xwe komî ser hev kiribû û cawbarank baş li laşê xwe pêçabû. Dema saeta wî ji bo yazdehê şevê kir tûke tûk, dusê dilopên girs ên baranê li ber deriyê berizdê ketin. Neptî ba û

baranê bi hev re şidandin û serma zêdetir bû. Bîstikeke din, ji xumîniya baranê û gujîniya bayî tişteke nedihat bihîstin. Dinya wiha reş û tarî bibû ku mirov tilî bixista çavê hev, kesî kes nedidît. Bapeşkê carcaran pêleke xwe dirêjî hundirê berizdeyê dikir û şiliyeke sar li bin guhê wî û cawbarankê dixist. Wê demê dîsa tezînok bi laşê wî diketin û bê hemdê xwe, laşê xwe komî ser hev dikir. Lê di vê bêhnê de jî bala wî her li ser lingê wî yê birîndar bû ku neheje û bi ser vî halî de êşê nekişîne.

Gelo çima ti pêjin ji hevalan nehatibû? Xwedê bike di vê ba û bahozê de ne li ser rê bana! Ger niha bi rê de bana, ji dîkilan xerabtir li wana hatibû û şil û pil bibûn! Ger derketibin ser rê û ber bi wana ve tînin, li wan zozanên rûtik niha ji serman re qefilîne û cihekî xwe lê bisitirînin jî tinebû! Ne berizdeyek, ne darek û ne jî kunek hebû xwe tê de parastibana; heta tava baranê derbas dibû. Gelo niha ghiştibûn ku derê? Dibe ku ghiştibin Latka Sorik. Baran ji wê derê nagre û tam li kêleka rêkê ye. Lê ger heta wir hatibana, wê sedî sed bi pêjna wana hisiyaba. Ne mumkun bû ku berek ji ber lingên wana negindire. Dev ji wê berde, di vê şiliyê de heta mirov gavek biavêta, wê deh caran biçerixiya, biketa. Di vî kaşê kafirbav de, meşa şevê wekî meşa li ser pira selatê bû. Kî diket, ew diçû wê dinyê. Ji xwe li jera Dola Şuminiyê avêtina gaveke şaş, dibû dawiya jiyana mirov. Rêk dihat û di serê zinaran re, li derdora latên tûj dizîvirî. Yekî/e van zîvironekan nebîne û gava xwe rasterast biavêje, wê di kevandeya ne serê wê, ne binê wê diyar e de biçûba xwarê û êdî bi heft werîsan jî nedikarîbû ji wir derketa!

Di dilê xwe de got ku, xwezî hevalên wî di vê şeva qiyametê de bi rê neketibin û ti qede û bele bi serê wana nehatibin. Ji ber ku êvarî dinya xweş bû, dibe hatibin xapandin û bi rê ketibin. Lê xwezî bi rê

neketibin û ew razîbû şeveke din zêde, di vî halî de bimîne. Bi ser halê wî de, ger ji rûyê wî tişteke bi serê hevalên wî bihata, êdî qet li xwe nediboriya. Ji xwe serê wî ketibû belayê; ti mafê wî tinebû serê kesekî din jî bi xwe re bixe belayeke din...

Di wê bêhnê de hevalê wî yê textor hat bîra wî. Têdigihîşt ku textor ji nehatina hevalan pir aciz dibe û teng dibe. Ger îşev jî heval nehatibana wê sibê yek carê bê moral bibaya. Gelo dikarîbû çî bike? Ji rûyê wî textor jî li van erdan tî û birçî dima. Yê wî ji xwe xwedê jê sitendibû; ma ya feqîrê textor çîbû? Qet nebe ew dikarîbû biçûya cem hevalan û bi wana re bimaya. Ya baş jî ev bû. Ger heta sibehê heval nehatibana, wê textor qanî bikraya û berê wî bidaya warê hevalan.

Piştî gihîşt vê ramanê, biryar da ku sibehê pêk bîne. Ji xwe heta êvarî nikarîbû bi rê bikeve. Heta wê demê jî, wê hatin û nehatina hevalan diyar bibaya. Êvarî jî dikarîbûn qasî yek-du saetan rawestiyana û pişt re textor bi rê biketa. Ji xwe ku heval bihatana, wê li ser rê li qay hevûdu bihatana û wê bi wana re vegeriyaba. Yanê ji her alî ve, di çûna textor de xêr hebû.

Dema gihîşt vê biryarê, êdî xwe pir dilrehet dît. Wekî ji Gelî xelas bûye û gihîştiye nexweşxaneyê, wiha coş hatibûyê. Xwe wiha dihesiband ku barekî giran ji ser milê wî rabûye. Lingê xwe yê saxlem di bin cawbarankê de dirêj kir û pişt re rahişt ê birîndar, ew jî di ber re kir cot. Guh da ser dengê baranê; niha nermetir dibariya û dengê mûzîkî derdixist. Bayê sar jî bi tevahî ji holê rabibû. Piştî xwe da erdê û serê wî ket ser çenteyê wî. Kefiya xwe kişand ser serê xwe û çavên xwe girtin ser hev. Ronahiyek ne diyar, li ber çavên wî reqîsî û bi milyonan stêrk di navê re herikîn. Laşê wî tev li lehiya

stêrkan bû û ew jî ber bi nediyariyê ve herikî. Mûzîka ji dengê baranê, wekî mizdana destê dayikê, ew di xewê re bir...

\*\*\*

## BÎST Û YEK

Bi pite pita baskên helîkopteran çavê xwe ji xewê vekir. Xwest ku rabe ser xwe, lê lingên wî neliviyên. Xwest ku qîr bide, bang li hevalên xwe bike, lê dengê wî derneket. Deste avêt çeka xwe û ewlekara wê vekir; libek fîşeng ji ber pengizî. Şaş ma ku fîşeng çawa di cihê ewlekarê re derdikeve der ve. Lingê wê paş de kişand û xwest libekê bide ber. Sê lib pêk re firiyên der ve. Bêhtir şaş ma û destê wî çû ser lingê teqînê. Valatiya ling girt û pêlê kir. Devê tîfingê bi jêrê ve hêdî bi hêdî xwar bû û libek fîşeng jê daket xwarê!

Serê xwe rakir û li hemberî xwe nêrî. Çend reşahî ber bi wî ve dihatin. Çekên dirêj di dest wan de bûn û lê direşandin. Ji devê tîfingan mozên sor û mozqirk ên zer derdiketin û di derdora wî re wekî bistên agir diçûn. Reşahiyan gav diavêtin, lê her li cihê xwe diman. Divîbû li hemberî wana tişteki bike.

Bombeya wî hat bîra wî. Ji ber xwe derxist. Banta lê pêçayî vekir. Pîmê wê rast kir. Hesinê wê, di kefa destê xwe de givaşt. Tiliya xwe, di xelesa wê re derbas kir û pîm jê kişand. Heta hêza wî heye, bombe avêt ser reşahiyan. Bombe di hewa rê çû û li raser ê serê wan daleqandî ma. Bêhnekê wiha li jorê hejiya û rawestî ma. Reşahiya tevan berê xwe dan jorê û li bombeyê nêrîn. Ew bi xwe jî şaş ma û çavên wî bel bûn. Dawî çiqiniyek metalîk ji bombeyê hat û şûna ku biteqe, ta jê bilind bûn û paraşûtek biçûk a spî vebû. Bombe jî weke berbûya xwe bihejîne hêdî hêdî daket nava reşahiyan. Reşahî tev kenîyan û dengê kenê wan di ezmanan re derket.

Careke din rahişt çeka xwe û lib ajot ber. Vê carê lib çû ber û çawa ku tiliya xwe da ser lingê wê, devê tifingê werimî û çiriya. Êdî çek bi kêrî tiştêkî nedihat! Bombe jî pê re nemabû! Êdî reşahî dikarîbûn bimeşin û nêzîkatî lê dikirin. Careke din da xwe ku rabe ser xwe û bimeşe. Lê wekî bi singan bi erdê ve hatibe kutandin, piçekî jî nediliviya. Careke din devê xwe vekir û qîr da. Lê dengê wî nehat guhê wî jî! Li ber xwe dida û xwêhdan bi laşê wî diket. Reşahî bêhtir nêzîk bûn. Êdî hewce nedidîtin ku xwe veşêrin. Reşahiyeke dest avêt çeka wî û bi çekê ve hişk ma! Reşahiyeke din çeka law danî ser milê xwe û pêlî lingê wê kir. Devê çekê hat girtin û agir bi paş de pîjiqî. Di wê bêhnê de hêza xwe hemû komî ser hev kir û xwe gij kir nava çavên reşahiyan. Vê carê ji cihê xwe liviya û zimanê wî jî geriya. Lê wekî birûskek ji ezman dakeve û li nivê kezeba wî bikeve, wiha bi êşeke dijwar veciniqî.

Laşê wî ji xwêhdanê bibû av! Li derdora xwe nêrî. Xweza qasî ku bi çav were hilbijartin ronî bibû. Ti reşahî li derdorê diyar nedikirin. Destê xwe dirêjî kêleka xwe kir. Çeka wî spartî dîwêr bû. Lê nêrî. Saxlem bû. Nû têgihîşt ku xewn dîtiye!

Operasyona destpêkê anî bîra xwe. Hîn berf li erdê bû û ew rojek bû nuqta xwe ya zivîstanê berda bûn. Bi rastî ne dema berdanê bû, lê bihîstibûn ku wê dijmin operasyonê bike, ji ber wê perwerda xwe bi dawî kiribûn û belav bibûn. Hêzên biryargehê derbasî nava daristanên binya Herekolê bibûn û li derdora Xirbikê Bestê xwe bi cih kiribûn. Giraniyên biryargehê; wekî pez, hêstir, nexweş û hwd. tev bi wan re bûn. Bêguman ên di saziyan de kar dikirin jî tev li cem wana bûn û ji bo wê hêzeke giran ku nedikarîbû bi rehetî şer bike, komî ser hev bibû. Lê baş bû ku saloxa çêbûna operasyonê girtibûn û xwe kişandibûn kûrahiya daristanên Bestan.

Qewetên şerkar jî tev bi fermanarê eyaletê re derbasî milê Kato bibûn. Kato çiyayekî dirêj û zirav bû. Cî û warê tê re derbas dibûn tev zozan bûn. Tenê Darên Qaçê lê şîn dihatin. Wekî din qirş û mirş û Gonî hebûn. Zivistanan pir sar bû û qasî du sê caran li bejna mirovan berf diket nava tehtên wê yên spî yên tûj û hişk. Bi rastî jî tehtên wê wekî kêr û guzanan tûj, wekî pola hişk û pirahî spî bûn – lê ne spiyê berfê, spiyê bi ser zer ve-. Gerîlayên herêmê pirahî zivistanan Kato vala dihiştin. Lê vê salê fermanarê herêmê biryar dabû ku qasî yekîneyeke hêza gerîla zivistanî li wir bimîne. Gelek sedemên vê biryarê hebûn û yek jê jî operasyonên dijmin ên biharê bûn. Li Besta, dema hîn dar nebişkivîne Artêşa Tirk operasyon li ser gerîlan çêdikir û ew tengav dikirin. Bi vê armancê jî Kato digirtin ku gerîla nikaribe ji Bestan derkeve û derbasî zozanan bibe .

Vê carê gerîla bi bicihkirina yekîneyeke xwe ya li Kato, însiyatîf ji dest neyarê xwe derdixist û dixist destê xwe. Yekîneya gerîla zivistanî li Kato veşartî mabû. Ji xwe cihê xwe di bin tehtan de çêkiribû û qûtê xwe ji payîzî ve tê de bi cih kiribû. Ji bo vê, dema hêzên gerîla bihîstin ku wê li Bestan operasyon dest pê bike, fermanarê eyaletê bi hêzên çekdar re berê xwe dan Kato.

Sibeha ku ghiştin nava tehtên Kato, helîkopterên Artêşa Tirk jî ji Şirnex rabûn û berê xwe dan çiyayên Botanê. Bi berbanga sibehê re pite pita baskên helîkopteran li navserên Kato hatin bihîstin û li Deriyê Qaçê û li Deriyê Beqan xwe nizm kirin. Hîn qasî du bejnan berf li erdê bû û darên li Bestan yekê jî bişkovkên xwe neteqandibûn. Di demeke ku ji bo Botanê hîn zivistan dihat hesibandin de, dest bi operasyonê kiribûn.

Ji vê operasyonê armanca Artêşa Tirk ew bû ku gerîla hîn di wargehên zivistanê de bigre û bi tevahî tine bike. Ji bo vê, bi



amadakeriyeke mezin hatibûn. Yek leşker tenê jî bi lingan nemeşiyabû; hemû bi helîkopteran anîbûn û di hundirê sê-çar saetan de ji Kato heta Kêlê, ji Kêlê heta Girê Rijdê, Serkê Mihemedê Oso, Çiyayê Filehan û Mewîjkê tev girtibûn. Bi kêmahî li ser sed girî leşker danîbûn û li gorî saloxa di destê artêşê de, derdora hemû nuqteyên gerîlan hatibû dorpêçkirin.

Bi rastî jî li gorî planê gerîla yê bicihbûna zivistanê wiha bû. Lê gerîla pêşya operasyonê hişyar bibû û wargeha xwe berdabû û yekê jî hêzeke mezin a gerîlan li Kato hatibû komkirin. Bi van sedeman Artêşa Tirk, hîn di destpêkê de ev operasyon winda kiribû.

Li Kato leşkerên ji helîkopterê xwe avêtin ser berfê –ku cilên spî yê rengê berfê li xwe kiribûn- di wê bêhnê de cilên wan sor bûn û li ser berfê dirêj bûn. Helîkopter filtî filtî bi hewa ket û dûr çû. Leşkerên li erdê man an xwe veşartin –ku pişt re ew jî ketin destê gerîlan- an jî hatin kuştin. Dema bi helîkopterê xwestibûn wana deynin ser tehtên Kato, wiha hizirîbûn ku ew der vala ye û wê bibe xeleka dawî ya çepera li dora Bestan bigerînin. Lê dema dîtin ku kî dadikeve erdê tê kuştin hewara xwe birin Şirnex û helîkopterên kobra di hewara wana de hatin. Lê tişteki ku ew jî bikin tinebû. Rokêt û guleyên wana di nava berfê de zêde kar nedikirin. Wekî din tehtên asyê yê Kato ji gerîlan re dibûn kozikên saxlem.

Artêşa Tirk çiqasî zor da xwe, nikarîbû Deryê Qaçê ji destê gerîlan derbixe û ji bo vê nikarîbû operasyona xwe jî bidomîne. Leşkerên di nava gerîlan de man –ku çendek ji wana teslîmê gerîlan bûn û dusê kes ji wan jî heta êvarî xwe di nava berfê de veşartibûn, êvarî ji nava berfê derketibûn û reviyabûn. Kuştîyên wan jî li wê derê mabûn. Leşker û cerdewanên dîl ketibûn destê gerîlan, demeke dirêj di destê wan de mabûn...

Artêşa Tirk ji vê operasyonê fêde qet nedîtibû û xisareke mezin gihiştibûyê, lê tecrubeyeke xurt jî bi dest xistibû. Ji xwe di wê demê de yekî li Başûr ji nava gerîla reviyabû jî, xwe dabû destê dijmin û rê nîşanî wana dida. Bi vê tecrûbe û rênîşanê, xwe ji bo operasyoneke din amade kiribûn. Gerîla bi serkeftina operasyona yekemîn, ji xwe piştrast bû ku heta demeke dirêj artêşa Tirk ti operasyonan neke. Lê ev ne rast bû û ji bo vê di destpêka biharê de, Artêşa Tirk piştî operasyona yekem bi demeke kin ku hîn dar nebişkivîne, careke din berê xwe dabû Bestan û dîsa sibehê bi pite pita baskên helîkopteran gerîlan çavên xwe vekiribûn...

Kişandina leşkeran berya berbangê destpê kiribû û heta bilindbûna tavê, nîvê Bestan bidest xistibûn. Dîsa yek leşker jî bi lingan nemeşiyabû, hemû bi helîkopteran anîbûn û li navsera gir û çiyandîbûn.

Vê carê gerîla di rewşeke teng de hatibû girtin. Ji bo sazkirina hêzên gerîla ku berê xwe bidin destpêkirina pratîka biharê, hemû li Bestan kom bibûn. Hêzên Garisan li derdora Pîro bûn. Biryargeh tev li pezê xwe, li derdora Mildirêjê bû û bi dengê baskên helîkopteran re berê xwe dabûn daristanên pişt Xirbikê Bestê. Hêzên çekdar ên bi fermanarê herêmê re, ew jî li derdora Çalan û Serkê Mihemedê Oso bûn. Li Kato kêr gerîla hebûn; ji bo sazûnê daketibûn Bestan û kêr jî bi milê Teht Reşê ve herikîbûn.

Hêzên gerîla yê di navbera Xirbikê Bestê û Pîro de bi cih bibûn –ku biryargehê jî heta nîvro xwe giyandibû wê derê- wiha dihizirîn, li derveyî çepera operasyonê ne. Lê bi nîvro re Artêşa Tirk sefereke din a kişandina leşkeran destpê kir û vê carê Herekol, Pîro, heta Girê Nîskê tev derdora Bestan xist destê xwe. Ji xwe Sibehê Kêla Memê, Kato û Girên li Bestan pirahî xistibûn dest xwe. Bi vî awahî piştî nîvro

–heta esir- li Bestan yek girê ku nexistine destê xwe nemabû. Gerîla bi tevahî û tev li hemû giraniya xwe di nava çepera artêşê de mabû. Wekî halê wan ne besî wan bû, karwanê cebirxaneyê jî wê şevê ji Cûdî bi deh hêstiran hatibû û ketibûn nava operasyonê û bi ser vî halî de komek gerîlayên jin jî ji Akademiyê bi wana re derbasî Bestan bibûn û bi hatina xwe re, xwe di nava sed hezar leşkerên Tirk de dîtibûn. Êdî şer, mirin û kuştin bê hesap wê bihata jiyandin.

Berya dar bibişkivin operasyonê dest pêkiribû û dema bi dawî bû daran pelçîmên xwe vekiribûn. Operasyon zêdeyî deh rojan ajotibû û gerîlan darbeya mezin dîsa ne ji destê dijmin, ji destê bêqûtbûnê xwaribûn. Leşkerên Tirk bi guhdarîkirina cîhaz ên bêtel têgihiştibû ku hêzên gerîla tev li fermanarê eyaletê, di nava wan de mane û bi vê sedemê behtir xwe şidandibûn...

Roja yekê bi ser biryargehê de hatibûn û pêz û hêstir tev ketibûn destê wana û tev hatibûn qirkirin. Gerîlan ketin şer, lê ji ber ku girên bilind tev di destê leşkeran de bûn, zêde nikarîbûn li ber xwe bidin û dest bi manevrayê kiribûn. Li dolikên Bestan leşker, cerdewan û gerîlan heta êvarî dan pey hev. Êvarî taveheyvek wekî rojê hebû û artêşa Tirk cihê komeke gerîla pêdandibû û bi hawin û rokêtên helîkopterê agir barandibû ser wana! Çendek ji wana giran birîndar bibûn û tev ji hev bela wela kiribûn.

Roja din dîsa ji cihazan têgihiştibûn ku wê hêzên Garisan û Fermanarê Eyaletê derbasî wî milî bibin. Di cih de leşker danîn wî milî û rêk jî heta Çiravê girtin. Ji ber vê, fermanarê eyaletê bi hêzên li gel xwe re, berê xwe dabû Çiyayê Kato. Lê li nivê rê – hîn negihiştibû Xirbikê Bestê- bi hêzên artêşa Tirk re ketibûn şer. Heta êvarî şerekî giran ê sîngê sîng domiyabû. Firokeyên şer çend caran hatibûn û bombe barandibûn ser çeperên gerîlan. Lê ji ber ku leşker

jî nêzîkê gerîla bûn, zêde nikarîbûn bi dilê xwe bombeyan bibarînin! Helîkopterên kobra yek pey yek, cote cot dihatin û li çeperên gerîlan dixistin. Li gorî wana divîbû yek gerîla sax nefilitîba. Ji ber ku him cihên bilind, him hijmara zêde, him teknîka herî modern û dijwar di destê leşkeran de bûn.

Piştî nîvro dema ku cîhaza mezin a fermandarê herêmê li ser laşê gerîlayekî ketibû destê artêşê, kefa xwe anîbûn. Wê demê di axaftinên cîhazan de diyar bibû ku ew kesê li Başûr ji nava gerîlan reviyabû jî, di operasyonê de cih digre û aqildariya leşkerên Tirk dike. Ew kes berê li Amed û Botanê jî mabû û rêk û rêbazên gerîla û erdnîgariya Bestan baş dinasî.

Dawî bibû êvar û ew roja dirêj û nexweş bi dawî bibû. Fermandarê Eyaletê êdi têgihîştibû ku nikare çeperê biqetîne. Gelek windahî dabûn û şerekî din wiha dijwar nikarîbû bidaya ber çav, ji bo wê berê xwe dabû aliyê Gundê Çalan ku berya rojekê operasyon li wir pêk hatibû...

Ew jî ji hêzên biryargehê qut bibû û sê rojan di nava çeper û kemînên leşkeran de mabû. Bi şev dimeşiya û bi roj xwe vedişart. Lê bi roj leşkeran xwe ji navseran berdidan dolik û geliyan û bi ser de dihatin. Wê demê pêwîst dima cihê xwe biguherîne. Heta ji dest dihat di dol û geliyan re û di cihê têrdar re dimeşiya. Bi vî awahî şevê li Girê Giyera, şevê li Mewîjkê derbas kiribû. Dema li binya nuqta Firnê rê ve diçû, hindik mabû biketa destê leşkeran. Herhal ketibû ber dîtina Kameraya Termal ku leşkeran di cih de ronahî avêtibûn jorê û şev bibû wekî rojê. Baş bû ku binya wî çal bû û bi lez xwe avêtibû çalê, ji awirên kamerayê filitîbû. Bi bêtêlê bi gerîlayên li cem fermandarê herêmê re axiftibû û têgihîştibû ku wê biçin

Çalan. Ji ber vê wî jî xwegihandina wir kiribû armanc û di şeva sisyan de li ber ava Çemkê Talo ghiştibû wana. Êdî rojên mayî bi hev re di nava tehtên Nuqta Konferansê de bi awayekî veşartî derbas kiribûn. Carekê ji fermanar re gotibû ku wê ev hal heta kengî û çawa bidome? Bi rastî dirêjbûna operasyonê û pîrbûna şehadetên gerîlan ew tev bê hiş û bê zar kiribûn. Lê fermanarê herêmê dizanîbû çi bike û gotibû:

- “Di rewşên wiha de serokatî dibije; ‘Yer yarilip içine gireceksin.’”  
Bi vê sedemê heta roja dawî her veşartî mabûn. Roja dawî ji axaftinên leşkeran ên bi bêtêlan têgihîştibûn ku paş de vedikşin. Wî du heval girtibûn cem xwe û çûbû ser Mildirêjê. Bi şev di nava kozikên leşkeran re derbas bibûn û dîtibûn ku tev vala ne. Derbasî milê din bibûn û xwe veşartibûn. Bi roj heta êvarî bi dûrbînê li leşkerên li navsera Serkê Hiryan temaşe kiribûn. Ber bi êvarî re cerdewan û leşkeran xwe berdabûn Xwarê Şêro û ji wir jî berê xwe dabûn jêrê. Hîn reş neketibû erdê, Serkê Hiryan ji leşker û cerdewanan paqij bibû. Lê li ser serê wan –li navsera Serkê Mihemedê Oso- hîn leşker hebûn. Êvarî helîkopterekê li wir jî danî, leşker li derdorê kom bûn, lê pişt re vala rabû û çû. Baş bû ku ev rewş dîtibûn. Dema vegeriyar nuqtê, gerîlayên li nuqtê digotin; qey leşkerê li ser serê wana jî çûye. Lê wan gotibûn ku neçûne û tenê ye li Serkê Hiryan çûye. Bi vê sedemê rojê din jî veşartî man. Dema bû êvar dîsa derketin kifşê û vê carê leşker ji Serkê Mihemedê Oso jî vekîşiya. Roja din êdî yek leşker li Bestan nemabû. Gerîlan ev deh roj bûn birçî bûn û di şer de pîr westiyabûn; ji destê dayîna şehîdan moralê wana jî daketibû.

Bi lez komên biçûk rêkirin navsera girên leşker tê de cih bibûn û nan û konserweyên li şûna wan mane kom kirin, anîn nuqtê û xwarin. Bi

vî awahî ji nû ve kabên wana xurt bûn û karîbûn rabin ser xwe. Pişt re laşên hevalên xwe kom kirin û veşartin. Piştî sazûna hêzên gerîlan jî pirahî berê xwe dan zozanan û ew jî ji bo biçê heremên hundirû, derbasî Kêla Memê bibû ku dema ji Heftanînê komên biçin hundirê welat werin, tev li wana bibe û derbasî hundirê welêt bibe. Lê di vê rawestîna de ketibûn şer û bi rokêteke helîkopterê birîndar bibû.

Ji xwe re got ku; herhal ji sedema di operasyonan de ewqasî bi helîkopteran re rû bi rû hatine û dîmenên wana di mejiyê wî de komî ser hev bûne, niha jî di xewna xwe de helîkopter dîtine...

Dizanîbû ku xewn ronîdayîna jiyane ne. Li binê vê berizdeyê jî her gav guhên wî li hêviya pite pita baskên helîkoptêran bûn. Êdî Artêşa Tirk ji aliyê teknîkê ve însiyatîfeke xurt xistibû destê xwe û di operasyonên notûheştan de ev raxistibû ber çavan. Birîndariya wî ji nîşana vê bû.

Dema ev hat hişê wî kenîya. Bi rastî jî gelek caran bi mirinê re rû bi rû mabû, lê dîsa jî birîndar nebibû. Lê vê carê dor hatibû wî jî.

Ji jorê du-sê ber gindirîn û ew ji hest û ramanên wî veqetandin. Hevalê wî yê textor xwe berdida jêrê. Bêhneke din li tehtê zîvirî û hat cem. Tal û tirşî ji mede wî dibariya. Rîha wî dirêj bibû û tev li gijika porê wî bibû. Nava porê wî jî tije qirş û mirş bibûn. Wiha lê hatibû ku mêş li pozê wî biketa, wê biba hezar parçe û biketa!

- "Roj baş, hevalê textor, tu hatî?"

- "Ma tu nabînî ez hatim?"

Bersiva wî jî wekî medê wî bû. Ya baş bê dengî bû. Gelo çima wiha xwe tirş û tal kiribû?

Textor çû ber berfa li ser cawbarankê rawestiya û çenga xwe di ava li ser cawbarankê kombûye de dakir. Çenga xwe tije kir û bir devê

xwe. Di du-sê qurtan de vexwar. Pişt re bi wî awahî du çengên din vexwar û hat li kêleka wî rûnişt. Destê xwe xist bêrîka yelegê xwe. Kîsikê tûtînê derxist û dest bi pêçana çixarê kir.

Di dilê xwe de got:

- “Wey, hîn tûtina textor heye!”

Textor cixareya xwe pêça û kîsê tûtînê dîsa xist bêrîka xwe. Çavên wî wiha li ser destê textor daliqandî man. Wiha dihizirî ku çiqasî medê textor tirş û tal be jî wê camêriya xwe ji dest bernede û kîsikê xwe dirêjî wî bike. Lê xwe xapandibû, textor camêrî ji bîr kiribû û kîsik berdabû bêrîka xwe. Êdî fêdeya xwestinê jî tinebû. Ku bixwesta û nedaba, wê xerabtir bibaya. Ya baş divêbû bi kurmê xwe bikarîba û rawestiba, heta ku ji rewşa textor tiştêk têdigihîşt.

Piştî du-sê hilm ji cixareya xwe kişandin, textor teqiya û bêdengî şikand:

- “De were ji wan re xeberan nebêje. Gotin, ‘Emê di rojekê de werin, ev bû hefteyek. Kî dizane niha li ku kêfa xwe dikin û em jî bi zikê birçî li ber sermê direqisin. Ma hevaltî wiha ye? Ez nizam çî bikim ji...”

- “Hewce nake tu xwe aciz bikî hevalê textor. Qey ji destê wana nayê werin vir. Herhal ne dîn in me li vir bihêlin. Lê tu rewşa hewayê dibînî. Wekî din jî belkî karekî wanî din derketibe, belkî...”

- “Wê çî karê wan derkeve? Herhal naçin ti tabûran ranakin.”

- “Ma bi zikê birçî wê çawa tabûran rakin? Ka bila xwe têr bikin, mala wana ava. Heta zozan venebin hal ev hal e.”

- “Ez nizam. Bila destpêkê bigotina, ‘Emê dereng werin, an nayên..”

- “Çî nabe, xwe teng neke. Bêhna xwe fireh bike wê hemû bibore.”

- “Erê heta bibore, emê jî biborin!”

Di ber xwe de veşartî keniya û bersiv neda. Dizanîbû ku textor pir aciz bûye û birçîbûnê jî li serî daye. Ew, ne xema wî bû; ji xwe fêrî birçîbûnê jî, tenêmayînê jî bibû. Lê ji bo textor ne wiha bû. Dawî wêr da xwe û got:

- “Hevalê textor ez dibêjim tu biçî li nuqtê binêrî, çawa ye!”

Textor serê xwe rakir û li nîvê çavên wî nêrî. Her du hevalan wiha li hev nêrîn. Lê awirên textor vala bûn, nedizanîbû çî bersivê bide. Ji bo vê bêdeng ma û serê xwe berda ber xwe.

- “Ji bo min qet meraq neke, ev neh-deh roj in ez çawa tenê dijîm, dîsa dikarim wiha li ber xwe bidim. Ê min, ji xwe ez birîndar im û bixwazim jî nikarim bi cihekî ve biçim. Lê tu dikarî biçî her derê. Hewce nake tu li vê derê bi min re birçî bimînî. Wekî din, ger tu biçî hevalan bibînî baştir e. Qet nebe tu dikarî saloxekê ji wan bigrî, yan bizanibî ka çima nayên.”

Textor got:

- “Ez dizanim çima nayên” û bi hêrs domand. “Niha her yekî xwe li binê darekê avêtine erdê û dixwin û vedixwin; ma wê çima werin?”

- “Tu neheqiyê li hevalan dikî lo. Xwezî hebaya û bila hevalan bixwara û vexwarana. Ne ez dizanim, niha li Gelî Tirşkê tenê goştê laşê xwe dixwin. Ma wê xwarinê ji ku bînin?”

- “Çima, bi bêtêlê dikarin şivanan bixwazin gel xwe û têr şîr, penêr û mast bixwin.”

- “Ew xeyal e. Ne ew dikarin bang li şivanan bikin, ne jî şivan tèn cem wana. Tu dev ji vana berde. Niha êvarî tê biçî yan naçî?”

Textor dengê xwe nerme kir û di ber xwe de bersivand:

- “Ez nikarim te li vir tenê bihêlim. Hevalan gotine; ‘Divê tu wî tenê nehêlî.’”



- "Tu dev ji gotina hevalan berde. Tu dikarî biçî yan na? Ger tu di xwe re dibînî, biçe. Şûna em du kes ji birçîyan re bimrin, bila yek be. Wekî din belkî hîn heval li cihê xwe bin û tu wana bibînî. Çûna te ji her alî ve baş e."

- "Ku ez biçim jî, ezê li te vegerim."

- "Ger tu hevalan bibînî, hewce nake tu bi xwe werî. Bila hevalên din werin û darbestê jî jibîr nekin. Bê darbest di dinyê de ez nikarim ji vir bi rêkevim. Divê tu jibîr nêkî."

- "Na, ez jibîr nakim. Lê ez dibêjim ku, em îşev jî bimînin. Baran rawestiyaye, dinya ber bi xweşiyê ve diçe. Belkî werin."

- "Ku werin hûnê bi rê de li hevûdu rast bîn. Ji xwe derveyî vê rê nînin."

Textor got:

- "Baş e" û destê xwe avêt bêrîka xwe. Kîsikê tûtînê derxist û bi lez cixareyek pêça. Pişt re kîsik dîsa berda bêrîka yelegê xwe. Çeqmaqê xwe derxist û cixare pêxist. Du-sê hilm li ser hev kişandin. Dûmana wê pif kir ber lingên xwe. Hilmeke dirêj kişand û di ber re axaftina xwe domand.

- "Ezê êvarî têra te berf bînim deynim cem te û biçim. Ger hevalan nebînim ezê dîsa li te vegerim, qet meraqan newxe."

- "Çi bi min nayê. Tu rehet biçe."

Wekî nû ferq kiriye, textor li hevalê xwe nêrî û bi dengekî ecêbmayî pirs kir:

- "Qey tu çixarê navexwî?"

Keniya. Dizanîbû ku textor êdî wê nivê tûtina xwe jê re bihêle. Ger berê textor neketiba jihevveqetinê qet bahsa çixarê nedikir. Ji bo wê, xwe da naz û şermê û got:

- "Ji xwe tûtin xelas bûye. Rojekê heye deh rojan nîne. Bila qet tinebe baştir e."

Lê textor jî ji gotin û dengê wî têgihîştibû ku ne bi dilê xwe diaxive û di rastiyê de dilê wî tûtinê dixwaze. Ji bêrîka xwe kîsik derxist û got:

- "Ka ez hinekî valakim kîsê te. Qet nebe, heta sibê wê te îdare bike. Tu jî wekî hêtûnê dikişînî. Hinekî kêk kêk vexwe, bila têra te bike."

- "Tu kêk kêk jî vexwî, zêde zêde jî vexwî wê her xelas be.

Kîsê xwe derxist û da dest hevalê xwe. Piştî textor qasî nîv qutî tûtin berda kîsê wî, êdî wî jî cixarek pêça û hilmêke dirêj kişand kûrahiya kezeba xwe. Lê kezeba wî jê re ne amade bû û hilm paş de pişkand. Li ser hev kuxiya û rondik bi çavên wî yên sorbûyî ketin."

- "Tê bifetisî!"

- "Çi nabe; wê derbas be. Min ji doh sibehê ve nekişandiye; ji ber wê ye."

- "Te çima nexwest?"

- "..."

Bêdengî di navbera her du hevalan de heta cixareyên xwe qedandin, berdewam kir. Piştî kişandina cixareyê, textor rabû ser xwe û got:

- "Xuya ye wê dinya vebe. Ez jî biçim hinekî xwe dirêj bikim. Şevê din ji sermayê re min qet xew ne kir. Tu tiştekî dibejî?"

- "Ma ezê çi bêjim? Biçe li rehetiya xwe binêre. Ji xwe êvarî tê bimeşî, ji bo wê têr binive."

Textor li berizdeyê zîvirî û piştî çend kevir ji ber lingên wî gindirîn xwarê, êdî tu pêjin jê nehat. Bêhneke din bi rastî jî ezman vebû û tîrêjên rojê xwe dirêjî berpalkan kirin. Pêl bi pêl hilm ji erdê rabû û

bilindî jorê bû. Tîrêjên rojê her ku diçû germtir û ronîtir dibûn. Ji xwe re got:

- “Êdî bihara zozanan wê nû dest pê bike. Niha wê heval gav bi gav ber bi zozanan ve bimeşîn; wekî koçeran!”

Meşa koçeran anî ber çavên xwe. Berf her ji ber wana direviya berpala û navseran. Koçeran jî gav bi gav didan pey berfê. Ji bo wê her roj bihar jiyan dikirin. Lê berf kîndar bû û payîzî tola xwe ji koçeran vedikir, êdî wê gav bi gav dida pey wana û koçer jî ji bilindahî û berpala gav bi gav direviyan gelî û deştan. Her cihê berdidan, berfê ji wana digirt. Niha gerîlan jî peywendiyêke wiha bi berfê re danîbûn. Dîsa destpêka bihara zozanan bû. Ji xwe artêşa Tirk, nedihîşt yek koçer tenê jî pezê xwe bibe zozanan. Zozan bibûn warê şer. Êdî li zozanan, an leşker hebûn, an gerîlan! Ne mî hebûn, ne bizin; ne kon hebûn, ne zom!

Gerîlayên Bestan, Beytuşebap, Çatak û Miksê tev niha li Kato, li Tehtreşê û li derdora Ava Masîro bûn. Çavên wana li berfê bûn ku xwe bi jorê ve bikişîne û ew jî bi peykevin. Ava Kaniya Xwê hîn kêmbibû û gerîlan ava şor dianîn, dikelandin û jê xwê bidest dixistin ku bi giyayê zozanan re bixwin. Sîrik, qorat niha ne li qîmê bûn. Êdî her roj bihar bû û bihar ber bi berpala Girê Nizmo ve diçû û wê heta Feraşînê biketana pey berfê. Berf wê ji ber wana her bireviya û hiliyaba. Li cihên hiliyayî wê bilbizêq, nêrgiz, heliz, rêwaz û giyayên cûrbecûr serî derxistibana û avzêyan li kêleka hevûdu wê dîlan girtibana! Hesreta wan avzêyan jî ghiştina Ava Masîro bû. Di bin tîrêjên rojê de dibiriqandin û di nava keskahiyê de dadiketin ser tehtên sor, zer...

Gelo ew roj hebû ku careke din rabe ser lingên xwe û li zozanan bigere?! Ka ku lingê wî çêbibe! Ji vir rizgar bibe jî, heta bigihê

nexweşxanê, kî dizane wê çend ameliyatan, derbas bike. Ka ew jî sax bibe yan nebe. Di dilê xwe de bi xwe re nêrîna xwe parvekir û bi xwe bersivand:

- “Zozan çûn êdî; te careke din zozan bi çavan nedît!”

- “Bila ezê jî piştî şoreşê helîkoptêrekê bigrim û li tevahiya zozanan bigerim!”

Dinya wiha germ bibû ku cawbarank ji ser xwe kişand, lê kefî hişt. Cawbarank di germê de xwêhdan dida û cilên wî şil dibûn. Dema dibû serma jî ev şilbûn li serê wî dibû qeda ku laşê wî zûtir dicemidand. Lê ji bo şikandina bayê dihat, baş bû. Ba di cawbarankê re derbas nedibû. Ji xwe li van çiyar sermaya dijwar tev ji bayê sar dihat. Dema ba tineba, dinya di berfê de jî germ bû. Hîn dihat bîra wî ku li Masîro û Teht Reşê çîrokeke qahremanî bi navê ‘Û Xwîn Diherikî Masîro’ nivîsandibû. Çîrok li ser şehadeta hivdeh gerîlayên bi xiyaneta qomutanêkî wan bû. Li derdora Tehtreşê li Girê Nêriyan, li Girê Ezmanan şerekî dijwar jiyabûn. Ji bo bîranîna hivdeh şehîdan, çîrok ji hivdeh pelên mezin nivîsîbû û helbestek jî li ser çêkiribû, bi ser vekiribû. Belê, dîsa ji destê xiyanetê zirar dîtibûn. Gelo çima Kurdan ewqasî xayintî dikirin? Çima Dewleta Tirk li ber dilê Kurdan ewqasî şêrîn bû ku piştî gelê xwe nedigirtin û xwe diavêtin dawa leşkerên Tirk?

Rahişt kîsikê tûtînê û cixareyek pêça. Bir nava lêvên xwe û pêxist. Dema tixan çû kezeba wî, awirên xwe dirêjî ezmên kir û di nava şînahiya wê de çû heta ber behra Sitenbolê. Şînahiya ezman ewqasî zelal bû ku di cih de şînahiya behrê anîbû ber çavên wî. Çûkên masîgir hildibûn û dadiketin...

Lingê wî qerimîbû. Kefî ji ser laşê xwe kişand. Bi kefa destê xwe ji erdê hêz girt û laşê xwe bilind kir, hinekî paş de kişand. Pişt re bi

her du destan rahişt lingê birîndar û kişand ber xwe, bi hêdî danî erdê. Kaba wî wiha xav bibû ku jan jê diçû. Ji xwe re got:

- “Hingî bê livandin dimîne kils girtiye; ev êş û jan ji wê ye. Xuya ye heta em ling çê bikin, wê kab ji dest biçe!

Rahişt kefiyê û dîsa kişand ser laşê xwe. Niha tevizîna lingê wî derbas bibû. Lingê saxlem jî kişand ber xwe û kabên xwe kirin cot. Êdî dikarîbû dîsa vegere xeyalên xwe.

Lê nehat bîra wî ku çî xeyal dikir. Zor da hişê xwe û çend tişt anîn ber çavên xwe, lê ne ew bûn. Ji bo wê dev ji xeyalan berda.

Wekî hinek jê re bêjin, destê wî çû bêrika wî û neynika xwe derxist. Cama wê toz girtibû. Bi serê guhê kefiyê paqij kir û da hemberî xwe. Bi xwe re rû bi rû hat.

Algûşkên wî bêhtir çûbûn kortê û hestiyê hinarkên rûyê wî derketibûn pêş. Qermîçokan xwe li derdora çavên wî rêz kiribûn û goştê binê çavan daliqandibûn, sist kiribûn. Burhê wî yê şikestî hîn kêmeke xwîn li ser ziwa mabû. Porê wî tev gijikî bû û wekî bêhtir spî bibû diyar dikir!

Devê xwe vekir û li diranên xwe nêrî. Ecêb! Diranên wî tam spî bibûn. Bi rastî berfê fêdeyeke baş dabû. Devê xwe girt û neynik berda bêrika xwe.

Li saeta xwe nêrî. Dem ber bi nîvro ve diherikî û bi rastî jî rojeke germ û xweş destpê kiribû. Êdî hilm ji erdê rancedibû û tava dijwar qaşûlê rûyê erdê hişk kiribû û tehtên şuştî tev ziwa kiribûn. Niha tam dema qîvarkan bû. Ger li binê kîjan helizê geriyaba wê qîvark bidîta. Dehrabe niha tije qîvark bûn!

Kefî kişand ser serê xwe ku bikaribe çavên xwe bigre. Êdî dilê wî dixwest, bêhnekê bikeve xewê. Çavên xwe girtin û zor da xwe ku ti tiştî nehizire. Lê ev yek ne hêsan bû û bi hezaran tişt dihatin bîra wî

û li ber çavên wî rêz dibûn. Dawî çavên wî ji nêrîna li ewqas bîranînan westiyan û çûn ser hev. Hêdî hêdî xilmaş bû û bêhneke din tam ji ser xwe çû...

Piştî esir ji ber xwe ve ji xewê rabû. Laşê wî sist bibû û ruyê wî mizeloqî bibû; kêmek xwêhdan bi tevahiya laşê wî ketibû. Bi guhikê kefiya xwe ruyê xwe paqij kir û bi xura çavên xwe hisiya. Tiliya xwe ya mezin û tiliya nîşanê. Her yek da ser kêleka çavekî ya bi ber dîwarê bêvilê ve û hêdî hêdî dewisand, heta ku êşiya. Dema berda, xura wê êdî kêmtir bibû. Her du destên xwe dan erdê û laşê xwe paş de kişand; li ser kamaxa xwe rûnişt û pala xwe da tehtë.

Li ezmên nêrî, şînahiyek bêdawî diyar dikir. Yek piç ewr nemabû. Sî ketibû ser Gelî û berpâlên Kêlê. Lê hewa ne sar bû; hîn germahiya rojê bandora xwe ranekiribû. Bi dengê bilbilekî/ê re awirên xwe ji ezman kişand û li jorê nêrî. Lê ji bin zikê berizdeyê wirdetir nedît. Xuya ye bilbil hatibû ser zinarê jora berizdeyê. Lê ewqasî bi coş û ji nivşkê ve xwendibû ku bala derdorê tev kişandibû ser xwe. Dengê wî/wê ewqasî zelal û sazkirî bû ku wekî şirîniya ava di lateke bilind re were xwarê û di nava çeçilan re biherike, wiha bilind destpê dikir û li hev dizivîrî, her diçû kêmbû û bi dawî dibû.

Bilbil bêhna xwe sitend şûn re careke din bi awaza xwe derdor tev bi coş kir. Vê carê awazeke cudatir derxistibû der. Wekî pêla avê ku li lat û zinaran bikeve û pêleke din bi pey re were dîsa lê bikeve û dîsa pêleke din, yeke din li pey hev werin û li zinaran bikevin wiha pêl bi pêl, bi dengekî zelal xwend.

Dilê wî ewqasî xwest ku wî/wê bilbilî/ê bibîne û ji bo wê laşê xwe xwar kir derveyî berizdeyê û xwest li jorê binêre. Lê çiqasî laşê xwe xwarî der ve kir jî, ji êşandina lingê xwe bêhtir ti fêde nedît û zinarê

bilind rê nedida ku jor were diyarkirin. Dema lingê wî êşiya dîsa laşê xwe paş de vegerand û piştta xwe da tehtê. Di dilê xwe de got:

- “Xwedê dizane niha bilbilekî/e çiqasî xweşik û rengin e!”

Pişt re rengê bilbil di xeyala xwe de anî ber çavên xwe. Periyên kesk, sor, zer, şîn, qehweyî, zêrînî û cûrbecûr, rengên din tev danîn ser baskên wê/wî, teriya wê/wî. Di cih de Akademî hat ber çavên wî û hat bîra wî ku li wê derê jî gelek bilbilên awazxweş hebûn. Wê demê hinek şîrêza bêhnxweş li ser betona ber deriyê odeya rêvebiriyê rijandibû û hinek nanê hûrkirî li derdorê belav kiribû. Ji xwe herdem bilbil ji ber xwe ve dihatin wê derê û li xwarinê digeriyan. Zikê xwe têr dikirin û diçûn. Lê vê carê du bilbil yek li pey yekî/ê hatibûn ser kêleka betonê û li pey piçên nanê firidandî, lingên wan ketibûn ser şîrêzê û çiqasî baskên xwe li hev dabûn jî nikarîbûn xwe ji zeliqokîbûna şîrêzê rizgar bikin. Ji xwe laşê wana ewqasî biçûk û nazdar bû ku bi vê liberxwedanê xwe tev perpitandibûn û bêhna wan çikiyabû. Ji xwe, bilbila xwediyê baskên zer û şîn, baskên xwe ewqasî bi tirs li hev dabûn ku dawî baskekî wê/wî jî ketibû nava şîrêzê û bi kêlekekê ve, bi betonê re asye mabû. Gurpe gurpa dilê wana ji sê gav dûrahî jî dihat bihîstin.

Ev cara yekemîn bû ku xwestibû bilbilek-du bilbilan bigre, bixe qesefê û bi xwedî bike... Dizanîbû ku wê bilbil ji azadiya xwe dûr bikevin û bi vê dûrketine jî pir biêşin. Lê di dema girtina wan de, nizanîbû ku wê dilê wî ewqasî bi halê wana bişewite. Hevalê ev rêbaza girtinê nîşani wî dabû, gotibû ku, ‘Pir hêsan e û ti xisar nagihê bilbilan’. Ji aliyê fizikî ve ev gotin dibe ku rast bû û ji dahfê yan jî ji kuştinê baştir bû –ev bê guman bû, lê ji aliyê giyanî û hestan ve qet ne hêsan bû-. Dema bilbilan li ber çavên wî li ber xwe didan û xwe diperpitandin, dilê wî hatibû givaştin û ji xwe bi dîtina gurpe gurpa

dilê wana, êdî biryara xwe dabû ku dev ji girtina bilbilan berde. Yek bi yek bilbil ji nava şîrêzê derxistibûn, bi destmalka xwe şîreza bi lingê wan û baskên wana ve paqij kiribû –heta ji dest wî hatibû- û pişt re ew danîbûn erdê ser axê. Bilbilan qet hêvî nedikirin ku ew careke din ji nava destê mirovekî bifilitin û bigihên azadiya xwe. Ji bo vê dema ew danîbûn erdê, bêhnekê wiha şaş û gêj li derdora xwe nêrîbûn. Pişt re baskên xwe li hev dabûn. Wekî dîsa bawer nekirîbûn, du sê gavan li ser lingên xwe pengizîbûn. Êdî tam baweriya wana rûniştibû ku azad hatibûn berdan. Destpêkê bilbilê/a rengê wê/wî zêdetir bi ser sor û qehweyî ve diçû fir da xwe û di nava teht û darên berûyan de ji ber çavan winda bû. Pişt re jî bilbilê/a reng kesk û zer firiyabû û ghiştibû azadiya xwe. Wî jî êdî careke din şîrêz nerijandibû ser betonê û bilbil negirtibûn. Lê her dengê bilbilan dihat guhê wî, li pey xwe dizîvirî û dinerî ku bizanibe gelo ew bilbilên girtibûn in yan ne ew in.

Ji bo wê dema vî/vê bilbilê/î jî xwendibû, bala wî hatibû kişandin û rêzebîranîneke dirêj di ber çavên wî re derbas bibû. Pir dixwest vê/vî bilbilê/î bibîne, lê nikarîbû bibîne û ji xwe dengê wê/î jî êdî qut bibû. Di dilê xwe de valabûnek û xavbûnek bihîst. Wekî tiştêk ji laşê wî biherike û biçê, wekî ji nava dilê wî vala bibe, wiha xwe dilşikiyayî bihîst.

Ser dilê wî tirş bû û nava wî kizirî. Hilmeke germ wekî bayê şewatê ji nava wî ber bi devê wî ve hilkişiya. Çavên wî qurmiçîn û bêhna wî teng bû. Heta bêhneke dirêj hesreta bilbilê/a xwendiyê ji dilê wî derneket û ji bîra wî neçû; her xwest ku bibîne û rengên wî/ê binase. Lê bilbil an xwe veşartibû yan jî firiyabû û çûbû.

Bêguman bilbil wekî wî nedihizirî û qet bi halê wî jî nizanîbû. Ji xwe belkî ew nedîtibû jî. Yan jî dema xwe ji bin berizdê dirêjî der ve



kiribû ku bilbil bibîne, belkî bilbil ew dîtibû û tirsiyabû, firiyabû. Mafê bilbil hebû bitirse, ji ber ku ewleyî bi mirovan nedihat. Bilbil bêguman ev yek dizanîbû, lê halê wî û hestên wî qet nizanîbû û wê nizanîbaya jî.

Berek ji jore gindirî û ew ji hest û ramanên wî veqetandin. Xuya ye textor dadiket jêrê. Gelo rewşa wî çawa bû? Bêhneke din, li tehtë zîvirî û hat. Bi rastî dît ku rewşa textor ne ti rewş e. Xuya ye çawa ji xewê rabibû, wiha daketibû jêrê. Di xew de xwe ewqasî gevizandibû ku şûtika wî bi milekî ve, rextê wî bi milekî ve sist bibûn. Zencira gumlegê wî yê leşkerî û qulpikên gumlegê wî yê neleşkerî heta nawqa wî vebibûn û berstûya atletê wî bi jerê ve pançilokî bibû, mûyên reş ên bi tov ên sînga wî, bi hev ve û tarî bûn. Medê wî tirs û xeydokî bû. Wekî reşahiya pirça sînga wî dabe rûyê wî, sî ketibû ser goştê algûşkên wî û çavên wî jî ronahiya xwe vemirandibûn. Porê wî neşehkirî bû û di navê de qirş û toz diyar dikirin. Şalê wî jî tev di nava toz û rûn de rengê xwe yê bingehîn winda kiribû. Pehniya pêlava xwe jî şikandibû û şimikî xistibû lingên xwe. Tiştê ku pê re bi rêk û pêk bû tenê çeka wî ya li milê wî bû ku çawa ghişt cem, ew jî ji milê xwe danî û sipart dîwarê berizdeyê û pê re got:

- “Kes nehat ne wiha?”

- “Ma vê ronîvrojê wê kî were?”

- “Kî dizane; min got belkî bi şev hatibin li derekê asyê mabin û bi roj xwe berdabin. Ji ber wê min pirs kir. Lê...”

- “Ez bawer nakim ku hatibin. Ger hatibana bi şev wê qet nebe çend kevir ji ber lingên wana gindirîbana û me dê bihîstaya.

- “Ez jî bawer nakim, lê dîsa jî min pirs kir. Ji xwe belkî qet neyên. Ma xema kê ye em li vir in?”

Xwe bêdeng hişt û bersiv neda textor. Şûna wê rahişt dirgekî biçûk ê berfê û bir nava lêvên xwe ku bimije. Textor bi bersifnedayîne bêhtir aciz bibû lê nedida der. Çavên xwe li derdora xwe digerand ku sedemeke axaftinê bibîne û dawî dît:

- “Zedê berfê nexwe, ne baş e, wê nava te bikizire.”

- “Çi nabe, ez fêr bûm êdî.”

- “Ma fêrbûna berfê jî heye? Her av e û dihile. Ne nan e, ne goşt e, ne nîsk û fasolî ne ku te têr bike û têr bihêle!”

- “Çi nabe. Niha bi vê diqede.”

- “Na wele naqede. Van hevalan em li vir hiştin. Ne nanek, ne xwarinek. Emê çi bikin wiha? Ma çi mecbûriyeta me heye em wiha bimînin? Qaşo heval in ji min re! Hevalên çi ne? Qomitan in! Qomîtanê çi ne? Ma wiha...”

- “Heval ji bo xwedê dev jê berde. Kî dizane niha ew jî di çi rewşê de ne. Hayê me ji wan nîne, hema tu xwe bi wan de aciz dikî.”

- “Ji xwe ezê xwe aciz bikim. Çima wê me li vir bihêlin. Gotin, ‘Rojek’; ev bû sê roj. Ma çi heqê wana heye ku ne rast biaxivin?”

- “Yaw belkî tiştêk bi serê wan hatibe. Belkî çûbin cihekî. Ma hema her tişt wiha hêsan e?”

- “Hêsan e, ma çi ye? Biçin ku derê jî dikarîbûn du-sê hevalan û hinek xwarin rêbikin.”

- “Tu bi ya min dikî hevalê textor em dev ji vê nîqaşê berdin û li ser çûna te biaxivin.”

- “Çûna çi, ez lingê xwe ji vir navêjim. Hingî derman di kabên min de maye ku êdî ez Çiyayê Kêlê derbas bikim. Wele ez gavekê jî ji vir navejim. Bila bên cenazeyê me her duyan bibin ji xwe re ku rehet bikin.”

- “Kes cenazeyê me nabe û rehet nake. Tu dev ji wan berde. Tu bixwazî, tu dikarî Kêlê jî, Herekolê jî derbas bikî. Him sê-çar rojên din wê bêhtir kabên te sist bibin û tu qet nikarî biçî? Qet nebe tu niha hîn li ser xwe yî û tê biçî Gelî Tirşkê têr giya bixwî, bi ser xwe werî. Ger heval li wir bin tê bizanibî çima nayên. Ger ne li wir bin jî, wê demê emê bizanîbîn ku serê me li ser çî balgîfê ye. Ger tu bi ya min dikî hema gaveke din lêxe û biçe!”

Textor awirên xwe zîvirandin ser wî û wiha bêhnekê vala vala lê nêrî. Pişt re awirên xwe zîvirandin ser cawbaranka ku berf di navê de ye. Bê ku biaxive çû ber cawbarankê û rahişt dirgê mezin ê berfê, danî ser tehtê. Pişt re cawbarank kom kir, hilgirt dest xwe û bê ku yek peyv ji nava lêvên wî derkeve, xwe berda jêrê, ser geliyê têrberf. Qasî çarîkeke din şûn re vegeriya. Nava cawbarankê qasî ku bi zorê rake, tije berf kiribû. Cawbarank danî cihê wê û dirgê berfê yê berê danîbû ser tehtê rakir, danî ser kêşiya berfê. Destê xwe bi şalê xwe ziwa kir û got:

- “Ev têra te du-sê rojan bêhtir jî heye. Wele min nedixwest te tenê bihêlim û biçim, lê ji ber te ez diçim. Ezê biçim nuqta ez jê hatime. Ger heval li wir bin baş e.”

- “Ger ne li wir bin jî tu dikarî li pey şopa wana biçî. Tu qet xema min nexwe. Ji bo min xwe nêşîne û aciz neke. Tu xwe bigihîne hevalan; ew ji bo me her duyan jî baş e.”

- “Na wele ku ez wana li wir nebînim, ezê li te vegerim. Ez te li vir tenê nahêlim.”

- “Na na, hewce nake tu li min vegerî. Ma tê ji bo çî vegerî? Ger şopên wan diyar bin, bi pey wan be biçe, baştir e. Yan jî biçe Bestan. Tê sedî sed hinek hevalan li wan deran bibînî.”

- “Kî biçê Bestan? Kî dizane niha hêzên Bestan li ku derê ne? Ger ez nebînim, ezê li te vegerim û hew!”

- “Neyse tu dizanî. Hema ji bo te çawa baş be tu wiha bike û baldariyê li xwe jî bike. Çi dibe, çi nabe. Belkî operasyon der hebe û heval ji ber wê nayên. Tu jî neçî, nekevî nava dijmin. Heta tu saxlem nekî, xwe bernede Gelî.”

- “Çi nabe. De bi xatirê te.”

Textor rahişt çeka xwe, da milê xwe û destê xwe dirêjî hevalê xwe kir.

Her du hevalan destên hevûdu hejandin û nexwestin li çavên hev binêrin. Kî dizane belkî ne qismetê wan bû ku careke din hevûdu bibînin! Belkî ji her duyan yekî jiyana xwe ji dest bidaya! Belkî heta textor vedigeriya, di bin vê berizdeyê de jiyana xwe ji dest dida!? Belkî jî textor biketa kemîna dijmin, an ji birçiyar re kabên wî sist bibana û ji kevandeyekê biketa xwarê! Wê demê kesî laşê wî jî nedidît û nedizanî ku bi çi awahî, li ku derê winda bûye jî. Gelek kesan wê bigotana; ‘Reviyaye!’ Ger rojekê bi rasthatinî laşê wî, yan cilên wî, çeka wî û hestiyên wî hatiba dîtin wê demê, wê hevalên wî bigotana:

- “Wey me belasebep gunehê textor xistibû stûyê xwe! Va ye ne reviyaye, şehîd ketiye!”

Lê niha va ye xatirê xwe dixwest û ber bi nediyariyekê ve diçû. Kî dizane belkî jî sax salîm paş de bizîviriya û heval jî bi xwe re anîbana! Heta daket gelî, gelî derbas kir û bi lat û zinarên berpâlên Kêlê re bi jorê ket, wiha demeke dirêj bi pey hevalê xwe de nêrî. Geh dilê xwe pê şewitand, geh hêviya xwe pê ve girêda...

Hêdî hêdî siya ketiye ser dolê tarî bû. Pişt re şînahiya ezmên ber bi gewrbûn û ji gewrbûnê ber bi tarîbûnê ve çû. Dawî stêrka wî diyar

bû. Heta ku çend stêrkên din li derdora wê diyar bûn û êdî çavên wî westiyan, li ezmên temaşe kir. Pişt re awirên xwe komî paş mijankên xwe kirin û dinya li ber çavên wî reş bû. Di dilê xwe de valatîyek dibihîst û êdî vê şevê derman di laşê xwe de nedidît ku hişyar bimîne û guh bide ser dengê lingên werin. Kefî kişand ser serê xwe û têtîliya xwe ji dinyê qut kir...

\*\*\*

## BÎST Û DU

Kêla Memê çiyayekî bi tena xwe bû. Milekî wê li aliyê Bestan dinêrî, milek li aliyê Qlaban dinêrî. Milê Bestan, milê Bakur û Rojava, milê Qlaban jî milê Başur û Rojhilat bû. Ji Bakur ber bi Rojava ve bi rêzê ji Çiyayê Kato ber bi çiyayê Herekolê, Çiyayê Pîro û heta Çêlê Nimêjê ku dadiket ser bajarê Şirnex kevanokek ji çiyayên serbixwe rêz dibû. Ji xwe ji Pîro hîn ber bi Bakur ve Çiyayê Serxwebûn –ku ev nav gerîlan lê kiribûn- Çiyayê Gabar û Çiravê cih digirt. Ji Çiravê ber bi Bestan ve li aliyê Garisan serê Girê Nîskê ji dûr ve bi rastî jî weke libeke nîsk a li ser latekê diyar dikir. Çiyayê Çaçê ji binya Girê Nîskê ber bi Rojhilatê Bakur ve dirêj dibû û di navbera Çaçê û Herekolê de tenê newaleke fireh cih digirt. Ji Çaçê di rêka Dola Erkent de, mirov dikarîbû bi rehetî çûba navsera Herekolê, navbera çalên volkanîk ên kunberfan û ji wir di Dola Sa re xwe ber bi Pîro û Bestan ve berdaba. Bestan di navbera Çiyayê Herekol, Pîro; Çêlê Nimêjê, Çiyayê Filehan, Guzekorkê, Kêla Memê û Kato de wekî behreke darîstanî diyar dikir. Ev behr ji hezaran girikên biçûk û dolikên teng û kin pêk dihat. Kêm zêde di pirahiya van dolikan de avzê hebûn, lê zêde ne xweş bûn; ji ber ku di cihên xîz de dizan.

Ji Bestan ber bi Kêla Memê ve rêka gerîlan bikar dianîn bêhtir di Mewîjkê re derbasî Serkê Mihemedê Oso dibû û ji vî serikî dihat serkê Diryan û di binya Girê Rijdê re xwe berdida ser ava Mêhrê. Ava Mêhrê ji nêzîkê Gundê Şaîbekir ji çend kaniyan diza û dihat, di binya Gundê Avyan, Girekê û Bacrît re ber bi Gosîne ve diçû. Li sêkuça Gosîne tev li avên ji dolikên Bestan kom dibûn û di çemê Meryemê, Besta Hincê û Çeqçeqok re diherikîn Gosîne dibû. Êdî dema xaka Bestan derbas dikir û diket xaka Çiyayê Cûdî û berê xwe Ji Bakurê Kurdistanê dida Başûrê wê, coka wê teng û asye dibû û pêlên wê xurtir û bileztir dibûn ku ji wê gavê şûn re êdî navê wê jî dibû 'Çemê Hêzil'.

Mêhrê bi xwe gundekî Filehan bû û hîn Dêra wê li pey xwe kevnareya xwe hiştibû. Li binya Dêrê darên gozan en pir mezin habûn. Rê di ser Ava Mêhrê re derbasî Başûr dibû û diket devê Gelî Tirşkê. Ava ji Gelî Tirşkê dadiket ser Ava Mêhrê wekî Ava Hozê dihat binavkirin û Hozê di berpala vî gelî de gundekî filehan ê cînarê Mêhrê bû. Gund piştî xwe dabû Çiyayê Qeplanê û li Girê Rijdê dinêrî. Dêra wê jî hîn kevnareya xwe diparast û di nivê zinarekî kevandeyî de wekî şikeftê hatibû kolandin û rêk bi kotekî diçûyê. Ewqasî xerabibû ku tenê diwarê pêşyê kêmekî mabû û bêhtir xwe dişibiya şikeftê. Lê dîsa jî mirov dizanîbû ku ev şikeft ne xwezayî ye û bi dest hatiye kolandin. Hundirê şikeftê tije ax û ber bûn. Kî dizane belkî dîroka vê şikeftê di binê vê axê û van beran de veşartî bû. Lê niha bêhtirê xwe gerîlayên lojîstîkvan galonên xwe yên tije fêkiyê hişkkirî, dixistin vê derê û bi rastî zû bi zû nedihat hişê kesî ku biçin li hundirê Dêrê binêrin. Ger bixwestana li hundirê Dêrê binêrin jî, bi rastî zû bi zû kesî di xwe re nedidît biçê hilkişê nivê kevandeya bilind. Di demên kevin ên Dêr dihat bikaranîn de, bê guman rêka

wê hebû û diyar e xweş bû jî; lê piştî valamayînê baran, berf û lehiyê rêk –ku ew jî bi destan hatibû lêkirin- cih bi cih hilweşanadibû û bi vê sedemê yekî ne wekî pezkoviyan zîrek ba, zahmet bû xwe bigihanda hundirê şikeftê.

Gelî Tirşkê bi rastî jî geliyekî ewqasî dirêj bû ku ne daketina wê daketin bû, ne jî hilkişandina wê hilkişandin bû. Ji navsera Kêlê destpê dikir û heta Ava Mêhrê cihê ku Ava Hozê digihişt ser, dirêj dibû. Ji vî cihê û bi jor ve darên gûzan, li kêleka avê, li pey hev heta dawiya daristanê rêz dibûn. Li xelaseka darên gûzan û kêmekî joretir êdî darên din jî diqediyên û cihên xwe ji devî û giyayên zozanan re dihiştin. Gelek kanî li Gelî Tirşkê hebûn û avên wana şêrîn û hênik bûn; lê ji aliyê hênikbûna xwe nedigihîştin Ava Serkaniya Mijîn û ji aliyê zelalbûna xwe jî nedigihîştin Ava Gelî Hejîrkê. Lê dîsa jî avzêyên Gelî Tirşkê, ji tevahiya Avên ji xîzên Bestan dizan zelaltir û hêniktir bûn...

Dema Hevalê wî ji gel wî bi rê ketibû û di dilê xwe de valatiyek bihîstibû ku kefî kişandibû ser serê xwe û têkiliya xwe ji vê dinyê qut kiribû; berya hevalê xwe bilindahiya Kêla Memê di Kavilê Memo re qulipî bû û di wê bêhnê de, xwe berdabû Gelî Tirşkê û ji wir jî derbasî Bestan bibû û li van deran tevan geriyabû.

Niha êdî wekî kefa destê xwe dizanîbû ku hevalên wî yên gerîla li ku derê ne...

Ji xwe li Gelî Tirşkê li ti kesî rast nehatibû; wekî difikirî, hevalên wî ji wir çûbûn –ma wê li wê derê birçî birçî çi bikrana? Ji xwe bi zanabûn hevalê xwe yê textor rêkiribû. Ger textor li cem bimaya, her roj wê bêhtir tengtir bibaya û wê tengezariyeke ne baş biketa navbera wana. Heta ku textor çûba Gelî Tirşkê û vegeriyaba, belkî hinekî bêhna wî hatiba ber û du-sê rojên din xwe fireh girtiba û di wê

navberê de jî, belkî heval di hawara wan de hatibana. Dizanîbû ku textor sedî nod li Gelî Tirşkê kesî nabîne û wê vala vegere! Wiha difikiri ku hevalên wî –yên bi hev re ketibûn şer- ger li Gelî Tirşkê bana, niha bi zikişkê ba jî, wê xwe gihandibana gel wî û lê xwedî derketibana. Ji bo wê bawer dikir ku ew ji wir çûne; him jî pir pir dûr çûne! Bi vê sedemê wî, wekî hevalê xwe nekir û awirên xwe vala vala li bin darên gûzên Gelî Tirşkê û li nava tehtên Qeplanê negerandin û li Hozê û Mêhrê jî nerawestandin. Awirên xwe dirêjî Geliyê Çemê Hêzil kirin. Baş dizanîbû ku ji Avyan heta Bacrît û Girekê bimeşe, sedî sed wê li hinek hevalan rast were. Niha hinek komên gerîlayên giredayî Biryargehê li berpâlên Mildirêjê, li Gosîne yan jî li ber Ava Hêzil kar dikirin. Belkî koma şivanan niha daketibe wan jêrahiyên Gundê Avyan! Ger ew ne li wir bin jî, niha Koma Çandiniyê li derdora Girekê û Bacrît bû. Fêkiyê wana niha çênebibû, lê ji bo avdan û parastinê sedî sed hin heval li wan derdoran hebûn. Ger li wan deran kes nedîtiba jî dikarîbû di Avyan re hilkişiyaba jorê û derbasî wî milê Serik bibaya û li Gundik, an li derdora Mewîjkê komên gerîlan ên cebirxanê bidîtana. Qet nebe dikarîbû xwe bida daristanên pişta Xirbike Bestê û nuqte bi nuqte li nexweşxanê bigeriya û bidîta. Ger hîn derman di kabên wî de maba, wê demê dikarîbû, di Besta Hincê re derbasî aliyê Girê Sêvo biba û heta gundê Zirvê bimeşiya û li komên hevalên karê nava gel dikirin rast hatibaya...

Lê mixabin, di vê gerê de wê ewqasî biwestiya ku ji hal biketa û mijankên wî yên bi hesreta hev wê dest dabana hev û ew êdî ne tenê ji dinyê, ji xeyalan jî qut kiribana...

Di xewna xwe de, sînorên Bestan jî derbas kiribû û derbasî Gabarê bibû. Di wê bêhnê de xwe gihandibû Geliyê Dêrşew û Basret. Di



nava rez de şaş mabû ku tiriyê kîjan mêwê û liba kîjan goşiyê bixwe. Ji nava rez derdiket û diçû nava zeviyan. Alesorên sitewiyayî, hinarên devçiriyayî, hejîrên pexoxî... Ji her darekê fêkiyek dixwar. Dihat bin dara gozê, çengek kakil çêdikir; diçû nava rez û bi tiriyê zer re dixwar. Diçû bin darên beîvan, çengek kakil (navik) ji wana jî çêdikir û dîsa dihat nava rez, ew jî bi tiriyê reş re dixwarin. Radihişt bîhokekê, gepek lê dixist. Lê qirika wî dixitimî û çavên xwe li kaniyekê digerland. Çi fêde nêzîkê Kanîreşê bû û dizanîbû ku ava wê pir giran bû. -Dema cara destpêkê ghiştibû ser Kanîreşê ji ber ku zêde têhnî bû, devê xwe xistibûyê û têr vexwarîbû. Lê dema devê xwe ji avê kişandibû wekî risas çûbe zikê wî, wiha giraniyek di nava xwe de bihîstibû û pê hisiyabû ku giraniya avê ye!- Ji ber vê zanîne, kêmek av vexwar ku tenê xeniqîna ji bîhokê hatiye, biçe.

Êdî ewqasî têr xwarîbû ku dikarîbû xwe bida jorê, nava tehtan û bêhnekê xwe dirêj bikraya. Li erdê rûnişt û lingê xwe dirêj kir... Bi wê bêhnê re, bi êşekê veciniqî. Lingê wî yê birîndar hatibû valatîyê û ji cih leqiyabû ku serê hestî wekî xincerê di goştê laşê wî re derbas bibû û ew ji xewa şêrîn rakiribû.

Çavê xwe vekir û dest avêt lingê xwe. Wekî mirov rahêje zarokekî pêçekê, wiha bi nazdarî rahişt lingê xwe û kişand ber xwe; pahniya xwe danî erdê. Pişt re lingê saxlem jî kişand û êdî dikarîbû li ser kamaxa xwe rûnê.

Kefî û cawbarank ji nû ve li ser laşê xwe rast kir û li saeta xwe nêrî. Hîn şev bi nêvî nebibû, lê dinya tarî bû. Êdî dema heyvê jî şaş kiribû. Dizanîbû ku êvarî zû dernakeve; heta nîvê şevê jî ne diyar e, lê ber destê sibehê ji ber ku pirahî diket xew nizanîbû derdikeve yan na. Ji xwe, ji bo wî jî ne xem bû. Tinebûna heyvê ji bo wî baştir bû; qet nebe dizanîbû ku di van şevên reş û tarî de, ti operasyon çênabin.

Gelo niha hevalê wî ghiştibû ku derê? Ger ti bele bi serê wî nehatibe divîbû niha li nuqtê, li gel hevalan baya! Lê hat bîra wî ku him di xeyalên xwe de, him jî di xewna xwe de li seranseriya Gelî Tirşkê geriyabû û li yek hevalî tenê jî rast nehatibû! Bi vê sedemê ji xwe bawer bû ku wê hevalê wî jî destvala vegeyiyaba. Lê dîsa jî wiha dihesiband ku Textor ghiştiye cem hevalan.

Êdî nizanîbû ji xwe re çi bêje. Ji aliyekî ve digot ku; 'Ez bawer nakim heval heta niha li Gelî Tirşkê mabin; ger li wir bana wê sedî sed bi me ve hatibana!' û ji aliyekî ve jî digot; 'Niha textor ghiştiye cem hevalan û çayê jî vedixwe!'

Xwe bi xwe re, diket nakokiyê û wekî ev dudiliya wî ne bes e, çay jî hatibû bîra wî. Bi rastî êdî nema dizanîbû çi bike ji vê bîra xwe ku tiştên ne di hiş û ramana wî de jî, wekî kaya mirov biderê, hildibû û derdiket ser avê. Di dil xwe de ewqasî bi nefsa xwe ve negirêdayîbû û dikarîbû bi rojan û şevan bê xwarin bimîne û ne çay, ne cixare qet tiştêkî venexwe. Lê çima ev tişt dihatin bîra wî û serê wî mijûl dikirin, êdî wî bi xwe jî nizanîbû.

Gelo ew ne wekî xwe bû? Dizanîbû ku carekê tam salekê cixare nekişandibû, lê pişt re dîsa destpê kiribû. Gelo ev destpêkirin ne lawaziya nefsa wî bû. Gerçî dema dev ji çixarê berdabû di nava rewşeke asayî de bû; li ser kar û xebata xwe bû û zêde pirsgirêkên wî yên kesaniyê û jiyaniyê tinebûn. Lê pişt re bi dîlgirtina xwe ketibû rewşeke tengazar û di wir de, di cihê lêpîrsîne de piştî îşkenceya pêncî û heft rojan domiyabû, rojekê leşkerê li ber derî hatibû û gotibû ku bixwaze dikare ji xwe re pakêtan bikire. Wê demê kêmek pere jî pê re hebûn û ev pêncî û heft roj bûn dest û çavên wî bi şev û roj girêdayîbûn. Destên wî tenê li hundir vedikirin, lê vekirina çav dibû sedema lêdaneke ne li qîmê.

Ji aliyekî ve dilê wî nedîçû çixarê. Lê belkî bi xêra çixarê çavên wî vekiribana û careke din ronahiya dinyê dîtîba! Ji bo wê pereyê xwe tev dabû û çend pakêt cixare xwestibû. Bi rastî jî bi hatina cixareyê re leşkerê li ber derî gotibû ku dikare paçê ser çavên xwe veke. Bi vî awahî careke din dest bi çixarê kiribû. Lê piştî du sê rojan têderxistibû ku vekirina çavên wî ne tenê ji bo kişandina cixarê bû û heta kirîna çixarê jî nîşana bidawîbûna lêpirsîna wî bû û berê wî dabûn Dozgeriya Leşkerî ya Diyarbêkrê. Li Dozgeriyê îfadeya wî girtibûn û piştî demeke kin ew rêkiribûn Zîndana Leşkerî ya Cûntaya 12ê Îlonê ya li Amedê. Li wê derê, bi mehan û bi salan bê cixare û bê çayê mabû. Ev yek qet ji xwe re nekiribû asteng û pirsgirêk. Di vê rewşa tengezar a niha tê de bû jî zêde ji bo wî hebûn û tinebûna cixarê ne pirsgirêkeke mezin bû; lê nizanîbû ji ber çi ewqasî xwe dixistin bîra wî û kurmê wana serî hildidan?

Dawî ghişt wê nêrînê ku bi sedema valatîyê ev tişt tîn bîra wî û ji xwe re got:

- “Ger niha karekî te hebaya, qet yek tişt ji vana jî nedihat bîra te û teyê karê xwe kiriba û di nava kar de xwe jibîr kiriba. Lê tu wekî Tiraleyê Bexdê ji sibehê heta êvarî û ji êvarî heta sibehê li ser derzika piştê vezilandiyî. Tu ne xwendinekê dikî, ne nivîsandinekê. Ê wê çawa çay û cixare neyên bîra te; rez û baxçe neyên xewn û xeyalan te?”

Lê ji aliyekî ve dizanîbû ku neheqiyê li xwe dike û xwe pir bi tiştên vala mijûl dike. Dilekî wî digot:

- “Ev di xwezaya mirov de heye. Hinekî zanistî bihizire! Mirovekî birîndar û birçî helbet wê xwarin were bîra wî û wê di xewna xwe de jî li bax û baxçeyan bigere. Mirovekî tî wê di xewna xwe de, her li kanî û robaran rast were. Divê tu vana bizanibî!”

Bi rastî jî ev tev dîzanîbûn û dîsa jî li ser vana û li ser gelek tiştên din, bi xwe re him gengeşî, him ev xeyal dikirin û bê guman xewnên wî jî bi vana dixemilîn. Lê ne ev tenê gelek tiştên din jî dihatin bîra wî û dadiketin nava xewn û xeyalên wî. Ji xwe tevahiya jiyana wî û hêviyên wî bibûn filmekî dirêj ku ji sedan kasêtan pêk dihat û her carê kasêtek dudu ji vana derdiketin ser biriqîna bibûkên çavên wî û ser kelûkortên mejiyê wî, nava kûrahiya dilê wî. Vana tev jî bandor li ser hestên wî dikirin. Carcaran dilê xwe bi xwe dişewitand; carcaran ji xwe re dahatuyeke dirêj û vekirî çêdikir; carcaran jî ber bi dema derbasbûyî ve diçû û lêpîrsîna kêmasî û şaşitiyên xwe dikir û pirahî jî ew sererast dikirin û wiha dihat roja tê de dijiya. Lê çiqasî sererast dikir jî, dîsa hin tişt tê de hebûn ku rast nedibûn û her astengî û tengezarî jêre derdixistin ser rêka wî. Çiqasî ew radikirin jî, dîsa di cihekî re serî didan der. Bi pehîna xwe pêlî serê wana dikir û ew bi erdê re dikirin yek. Lê dema gava xwe diavêt û li paş xwe dizîvirî didît ku dîsa serî rakirine û ji paş ve şaxên xwe dirêjî sukra wî kirine û dev jê bernadin...

Lê vê carê bi biryar bû û ev serpêhatiya dawî bû ku wê jê fêrbûnek mezin bigirta. Êdî hemû jiyana wî li ber çavê wî bû û hemû şaşitî û kêmasiyên xwe li ber vê keviya berfê dîtibû. Ji bo naskirina xwe gelo divîbû çûba wê dinyê û vegeriyaba? Ji xwe ew miribû, lê ji xwe nemiribû. Wekî carcaran bi deng jî ji xwe re digot, 'Ji bêariya xwe' ne miribû. Ger bi ya hevalên wî ba ya, divîbû hîn li cihê ku şer qewimî bû, cihê ku lê birîndar bibû; bombeya xwe bi xwe de teqandiba û jiyana xwe bi dawî kiriba! Lê bi rastî ew dil ti caran di xwe de nedidît û gotibû; 'Ger mirinek min hebe bila bi guleya dijmin be; ez ti caran hêviya xwe ji jiyane qut nakim û ti bombeyan bi xwe de nateqînim.' Di wê bêhnê de filmekî şoreşa welatekî Balkanan

hatibû ber çavên wî û ew dîmen her di dilê xwe de dabû jiyandin û xwestîbû ku mirinek wî hebe, bila wekî ya wî leşkerê heta guleyên dijmin laşê wî fikir wekî seradê jî wî çeka xwe ji dest bernedida û her gule bera dijmin didan baya. Belê ger mirinekê wî hebaya divîbû mirineke wiha baya û derveyî vê mirin –hele mirina bi destê xwe-qet li gorî xwe nedidît û ji xwe nediwêrî jî. Ji bo wê dema hevalê wî yê dawî ji cem veqetiyabûn çiqasî xwestibûn çeka wî jê bigrin û tenê bombeyekê li gel bihêlin jî; çeka xwe nedabû wana û bombe negirtibû ser xwe. Di dawî de ev nêrîna wî ya li ser teşeyê mirinê, ew gihandibû jiyane; him jî ji mirineke sedî sed. Ji xwe hevalên wî ew mirî dizanîbûn; heta destpêkê hatibûn li cenazeyê wî bigerin; lê bi saxî lê rast hatibûn û şaş mabûn. Gotina yê digot: ‘Ev can ne yê we ye... Hûn nikarin wiha erzan jiyana xwe bi dawî bikin. Divê hûn xwîna xwe dilop bi dilop biherikînin...’ herdem dianî bîra xwe.

Ev tev rastiyeke bû ku divîbû her gerîlayî şopandiba; lê mixabin gelek caran xwîna xwe bi carekê re guşînî jê dianî û wekî lehiyê dirijandin. Canê xwe nediparastin û erzan jiyana xwe ji dest didan. Hinek jî hîn derfeta şer li ber wana bi dawî nebûbû, bi lez dev ji jiyana xwe berdidan. Bêguman, bi destê xwe bidawîkirina jiyana xwe, wêrekiyeke mezin dixwest û wî qasî ku vê yekê bike xwe wêrek nedidît û li gorî zanabûn û ramana wî; ‘Kuştina gerîlayekî karê dijmin bû, ne karê gerîla bi xwe bû. Gerîla heta dilopa xwîna xwe ya dawî divîbû berê tîfinga xwe bida dijmin û pêlî lingê wê bikraya. Êdî ger mirin dihat, bila bihata! Ji xwe her gerîlayî ev soz dida ku heta dilopa xwîna xwe ya dawî têkoşîn bidaya û domandiba...

Ew jî bi helwesta xwe, bi vê sozê ve girêdayî mabû û bi ser ketibû. Çirandina çepera dijmin wekî çirandina kefenê mirinê didît û êdî ji nû ve jiyaneke li ber dirêj dibû. Di vê jiyana nû de divîbû her li paş

xwe nêrîba, lê êdî ti tişt wekî yê berê nekiriba.

Ev biryareke baş bû. Ji xwe baweriya wî pê dihat ku wê heval werin û wî ji vî Gelî derxin, bibin. Dianî xeyalê xwe ku ji Gelî derdikeve; Kela Memê derbas dike, Bestan derbas dike. Li ser piştta hêstirê bi roj û şevan dimeşe. Sînor derbas dike. Dawî digihê nexweşxanê. Bi cilên spî hemşîre û textor li derdorê dizivirîn. Berê wî didin odeya ameliyatê. Çav li kêr û meqesan dikeve û kezeba wî ji wan diqete! Dixwaze qîr bide û bireve der ve. Lê bê hiş ketiye û dest û lingên wî hatine girêdan. Gelo wê ji ameliyatê sax derkeve? Gelo wê lingê wî rehet bibe? Gelo wê seqet bimîne? Gelo di vê derbarê de textor çî dibêje?

Xwezî textor ji cem xwe rênekiribaya! Ku niha tiştêk bi serê wî de hatibaya, wê çawa li xwe biboriya? Kî dizane belkî li Bestan operasyon hebû? Belkî li Kato yan jî li Teht Reşê operasyon hebû. Belkî li Kêlê bi xwe, li Gelî Tirşkê, li Girê Rijde bi xwe operasyon hebû û heval ji ber wê cihê xwe berdabûn, nikarîbûn li wana vegerin? Kî dizane belkî feqîrê textor niha ketibû nava kunmoza dijmin, an kemîna dijmin. Gelo niha sax bû?

Xwezî ew rênekiriba! Ka wê ji paşeroja borî aqil bigirta û êdî kêmasî nekiriba? Hîn di destpêkê de, dîsa bi kemasiyê destpê kiribû; wê kengî hiş bigirta?

Dema ronahiyê da ser Gelî ji hest û xeyalên xwe, ji tirs û xovên xwe veciniqî. Destpêkê wiha hizirî ku tava heyvê ronahiya xwe daye ser Gelî. Lê pişt re li ezmên nêrî ku pirahiya stêrkan ronahiya xwe temirandine û lihêfa xwe kişandine ser çavên xwe. Êdî dema berbangê bû û vê şevê jî ti hevalên wî, di hawara wî de nehatîbûn. Bi ser vê de, textor jî çûbû û venegeriyabû. Ger bixwesta, di şeva

xwe de dikarîbû vegeryaba. Yekî saxlem –ku textor baş saxlem bû-  
ji vî Gelî heta wî Gelî di şevê de dikarîbû biçûya û bihata. Gerçî wê  
zêde westiyaba, lê ji mayîna bi tena xwe çêtir bû. Lê wî hevalên xwe  
baş dinasîn. Niha textor dema gihiştibû nuqta hevalan û ti kes li wir  
nedîtibû, kabên wî di cih de sist bibûn, dilê wî şikestibû û xwe  
avêtibû erdê; kefiya xwe kişandibû ser xwe û pix kiribû xewê!  
Êdî laşê wî jî westiyabû û xeweke germe xwe dida ser çavên wî.  
Mijankên wî dîsa bêriya hevûdu kiribûn.

Bi her du destên xwe rahişt lingê xwe yê birîndar û li erdê dirêj kir.  
Lingê saxlem jî di ber re kir cot û serê xwe danî ser çenteyê xwe.  
Kefî û pişt re jî cawbarank kişand ser laşê xwe. Serê wî hîn li der ve  
bû û her çiqasî çavên wî bi hesreta xewê dişewitîn, dîsa jî dilê wî  
nedixwest razê.

Hevalê wî yê textor ji ber çavên wî nedîçû. Li nuqta Serê Daran  
dirêj kirî bû û careke din ranedibû ser xwe! Gelo çi pê hatibû? Xwezî  
niha karîba raba ser lingên xwe, meşiyaba û çûba, li ber serê wî  
rawestiyaba! Çend dangan bang lê kiriba û ew hejandiba heta ku ji  
xew hişyar fikir...

Dilê wî jêre digot:

- “Te ne baş kir ku textor bi tenê rêkir. Ger vê carê saxlem vegere  
divê tu bimirî jî careke din wî bi tenê rênêkî derekê.”

Ev peyv wekî kurmekî di dilê wî de tevdigeriya û kul û kederên wî  
vedipexirandin...

\*\*\*

## BÎST Û SÊ

Çiqasî dixwest bikeve xeweke kûr û qet ranebe, heta ku hevalên wî  
werin ser serê wî û bang lê bikin. Lê fikir û nedikir xew nediket

çavên wî. Dema serê xwe ji bin kefiyê derdixist xeweke dijwar êrîşî ser çavên wî dikir û kêlekên çavên wî dişewitandin. Lê dema kefi dişikand ser serê xwe, dîmenê çûna hevalê wî dihat ber çavê wî û di wê bêhnê de, xew ji ser çavên wî direviya û diçû.

Bi berbangê re roja, tewra dirêj a piştî şeva tewra dirêj destpê kiribû. Ne saet pêş ve diçû ne jî roj. Dawî biryar da ku xwe bixe nava lepên xewê. Kefî ji ser sere xwe avêt û ronahî ket ser çavên wî. Mijankên wî hêdî bi hêdî bi ber hevûdu ve dest dan hev û bang li ferîştaya xewê kirin. Vê carê hişê wî bi tevahî vala bû û germahiyê bandora xwe da ser pêlûyên çavên wî û ji dest xwe çû...

‘Wê rojê heta lê bû êvar, bi dehan caran wê hişyar biba û biketa xew, lê dîsa jî wê dem derbas nebûbaya...’

Ev gotin li cihekî bihîstibû, yan di pirtûkekê de xwendibû. Êdî nedihat bîra wî, lê tenê dizanîbû ku peyveke wiha ji bîra wî ne dût bû. Sed xem û xeyal dihatin ber çavên wî û tev li xewnên wî dibûn. Çi xewn e, çi xeyal e ji hev zêde cuda nedikir. Xewnên xwe di xeyalên xwe de, xeyalên xwe di xewnên xwe de didomandin û dixwest tevan bigihîne encameke li gorî xwe yan li gorî dilê xwe.

Ji ber çi xewn û xeyal ne dûtî hevûdu bûn? Çima her du jî ne di destê mirov bi xwe de bûn? Berê digot; ‘Dema mirov bixwaze xeyalan dike, dema bixwaze xewnan dibîne’. Ji xwe di rojnameyekê de xwendibû ku xewn pirahî li ser bûyerên rojanê dihatin dîtin û bawer kiribû ku wiha ye. Lê di vê dema birîndariyê de, êdî roj bi roj têdigihîşt ku her tişt ne bi destê mirov e û mirov tenê perdeya sînemê ye. Mekîneya wê, filmê wê li cihekî derveyî mirov bû. Ronahiya ji mekîneyê dîmenên filmê dibirin ser perdeyê jî; hest, raman, hêvî û daxwazên mirov bûn. Mirov digot qey senaryoya wê bi destên xwe dinivîsine, lê ew ji bo xeyalên rojane, yên hêsan wiha



bû. Xeyalên giran ên watedar û gring, ji aliyê hest û ramana mirov a ku ji dîrokê dirêjî pêşerojê dibe, dihat nivîsandin. Ji bo wê dibe ku destpêkê bi awayekî hêsan kevirek ji bo bingehê xeyalekê datanî, lê pê re însiyatîf ji dest wî derdiket û qet tiştên ne li bala wî, dihatin xeyalên wî. Wiha di nava xeyalan de winda dibû ku dawî ew bi xwe jî şaş dima bê çawa evqas tişt anîne xeyalê xwe û ewqasî li hevûdu anîne!

Xewnên wî jî ne kêmî xeyalên wî bûn. Qet tiştên ti caran di hişê wî re derbas nedibûn, dihatin xewna wî. Ji xwe yek ji wan xewnan ti caran ji bîra wî nedichû û demekê ji gelek sofî û aliman pirs kiribû ku wateya wê xewnê çi ye? Lê her yekî bersiveke li gorî xwe dabû û yek tenê jî neketibû serê wî. Wî bi xwe jî ti wate ji wê xewnê re nedîtibû. Wê demê hîn şeş an heft salî bû û havînan di rojên taveheyv de li hewşa wan a fireh bi zarokên cînarên re bi veşartokê dileyistin. Şevên havînî yên taveheyv ne kêmî rojê ronahî û germ bûn. Wekî dayika wî digot: “Mirov di şevên wiha de, dikare ta bi derziyê veke,” wiha ronî bûn.

Hewşa wan ji bo leyîstoka veşartokê pir baş bû. Çar malên li kêleka hev rêz dibûn, hîn dîwar di navbera hewşên xwe de nekişandibûn û ji ber vê yekê hewşeke fireh, hevbeş bikar dianîn. Zarokên van her çar malan hema di vê Hewşê de digihîştin hev, dibûn birek û qîje wîja wana têrê dikir ku derdorê aciz bikin. Ji xwe ji hewşê qet pevçûn qut nedibû. Roj derbas nedibû ku du zarokan li hevûdu nedixistin û giliyên hev li ber dê û bavên xwe, yan li ber birayên xwe yên mezin nedikirin. Êdî ger wê rojê bêhna dê û bavên wana teng baya û li cînarên xwe li mahneyekê bigeriyana, ev gilî dikirin hincet û sed xeber ji hev re didan, xwe li serê hev vala dikirin. Lê ku dilê wana ev yek nexwesta, di cih de bi zarokên xwe de dixeyidîn û guh

nedidan gilî. Lê dîsa jî zarok, her bêhn û her gav dihatin cem hev û bi roj bi xaran, bi şev jî bi veşartokê dileyîstin. Zarokên mezin dikarîbûn bi xar û pere jî bileyîzin û gelek caran diçûn taxên din, bi xortên wan re dileyîstin. Lê yê biçûk pirahî li ser xaran dileyîstin. Bes bi şev hemû dihatin cem hev û bi veşartokê dileyîstin. Xortên wê şevê neçûbin sînemê jî, li wana temaşe dikirin û zaroktiya xwe bi bîr dianîn...

Di lîstika veşartokê de, yekî serê xwe dida dîrekê elektirîkê yê hesin ku di nîvê hewşê de hatibû çikandin û dest bi hijmartinê dikir. Ev dibû dayik û heta hijmartina wî xelas dibû, çavên xwe vedikirin û li pey xwe dinêrî ku yek kes jî nemaye. Êdî xwe dixist şûna wan û li wana digeriya. Ger kî bidîta ew dişewitî. Ger bêyî wî, yekî bihata destê xwe li dîrekê elektirîkê bidaya, ew azad dibû û êdî dikarîbû alîkarî bidaya hevalên xwe yê veşartî ku zû neyên dîtin. Vê carê yê dişewitîn –yanî dihatin dîtin- yek ji wana dibû dayik û leyîstok didomandin. Lê zahmetiya vê leyîstokê ew bû ku dayik carnan pêwîst dima biçûya cihên tewra xewle û li zarokên veşartî bigeriya. Di cihên xewle de jî bi rastî gelek caran kabên zaroka bûye dayik dilerizîn û tirs diket dilê wî, nediwêrî zêde li wir bimîne; ji ber ku dayikên wan gotibûn, bi şev cin û hût digerin û mirî jî ji tîrbên xwe radibin, zarokan direvînin dibin ji xwe re! Ji bo wê, hemû leyîstokên wan di bin vê tirsê de derbas dibûn û tenê di şevên roja çardehê biriqîna heyvê de û di şevên nêzîkê vê rojê de, bi veşartokê dileyîstin. Di şevên bê taveheyv de qet nediwêrîn bileyîzin.

Di şeveke wiha ku heyv wekî hinarkên ruyê keça çardehsalî diterisî de, li ber dîrekê elektirîkê dora wî ya dayiktiya lîskê bû. Dema hijmartina xwe xelas kiribû û çavên xwe vekiribûn, dîtibû ku yek zarok tenê jî li derdorê nemaye û tev çûne xwe veşêrin. Wiha li

derdora xwe nêrîbû ku biryarê bide, bi kîjan alî ve biçê, lê di wê bêhnê de wekî deriyek vebe zîrqîniyek hatibû ber guhê wî û serê xwe rakiribû, li cihê deng jê hatibû nêrîbû. Di wê nêrînê de dîtîbû ku di ezmên de bi vê zîrqîniyê re şibakeyek vedibe û dengê ji wir bang li wî dike! Deng digot: 'Ey însanoğlu bir gün bir ölü kalkacak, bütün dirileri yiyecek!' û sê caran ev gotina xwe digot, ango sêbare dikir. Pişt re çawa ku bi zîrqîneyekê şibakê vebibû, dîsa bi zîrqîniyêke wiha dihat girtin û di wê bêhnê de, ji xew vecinîqîbû û dîtîbû laşê wî tev di nava xwêhdanê de maye.

Wê demê zarok bû û ti wate nedabû vê xewna xwe. Lê dema hinekî –çend salên din- mezintir bibû ji hinek sofî û aliman pirsîyabû. Lê bersivên dabûn qet serê wî ji wana negirtîbû û bersiveke bikaribe wî têr bike nedîtîbû. Dema çûbû bajarê Stenbolê jî, ji sofîyekî zanyar pirs kiribû û sofî gotîbû ku 'Te di xewna xwe de rewşa Kurdan dîtîye. Kurd heta niha mirî ne. Wê roj were û rabin ser xwe.'

Ev bersiv kêmekî watedar bû, lê ev miriyê rabe wê ji ber çi hemû zindî bixwarana? Ger wiha bikraya wê demê çi ferqa wî/wê ji wan zindiyên ku ew kuştîbûn dima?

Ev xewn wê her di bîra wî de ba û wê bixwesta wateya wê zaniba. Lê tiştê di zaroktiya wî de nehatîbû hişê wî jî, di ciwantiya wî de hatîbû bîra wî û bêhtir hiş ji serê wî birîbû; hişê maye jî tev li hev kirîbû! Dema şibake li ezman vebibû deng bi Tirkî axiftîbû. Gelo ji ber çi bi Tirkî axiftîbû? Ew hîn nû diçû dibistanê û tenê ev du sal bûn fêrî Tirkî dibû. Wekî din zimanê dayika wî Kurdî bû û ji ber çi zimanê Tirkî heta xewna wî destdirêjî kirîbû nava jiyana wî?

Ev pirs jî di serê wî de bûbû pirsgirêkêk û dawî ghiştîbû wê encamê ku deng dengê xweda bû û xweda jî –li ser serê kurdan- Tirk bû, yan

jî wekî hemû Kurdan vî xwedayî jî qedexeya li ser zimanê Kurdî dizanîbû û ji tirsê Dewleta Tirkî re bi tirkî peyivî bû!

Ecêb e ku di vê roja dirêj a Hezîranê de ew roja xewna şibakeya li ezman vedibe dîtîbû, dîsa hatîbû xewn û xeyala wî. Yan çavên wî xilmaş bûn û xeyal dikir, an jî di xew de, xewna xwe didît. Lê ji ber ku bêhnekê di xew de bû, bêhnekê hişyar bû, êdî nema dizanîbû çi xewn e û çi xeyal e.

Lê ne tenê ew xewn, xewnên din jî yên ku berê dîtîbûn û şopa xwe bi awayekî kûr li ser hiş û mejiyê wî hiştîbûn dihatin ber çavên wî, yan jî di xewna xwe de xewnên xwe yên kevin didîtin.

Dawî bi saya gurçikên xwe pêwîst ma ku xîret bike rabe, li ser kamaxa xwe rûnê û ji bandora van xewnerojkan rizgar bibe. Dema li ser kamaxa xwe rûnişt bi piştê destê xwe her du çavên xwe baş firkanandin ku hinekî bi ser hişê xwe were. Ger gurçikên wî ewqasî zor nedabanê, belkî hîn jî xwe daba peyvandin. Lê ji mêj ve av nerijandibû û êdî di gurçikên wî de cih nemabû. Bi lez kefi û cawbarank ji ser laşê xwe avêt û bi alîkariya kefa destên xwe, laşê xwe rakir û danî, rakir û danî, ta ku qasî du gavan ji binê berizdeyê dûr bikeve. Pişt re doxîna xwe vekir û xwe bi milê lingê xwe yê saxlem ve xwar kir; bêhna xwe berda...

Piştî xwerekirîna, dîsa bi alîkariya kefa destên xwe vegeriya cihê xwe. Lingên xwe di ber hev re dirêj kirin û kefi avêt ser. Cawbarankê, ji bêhnsitandin û berdanê xwêhdan girtîbû û şil bibû. Ji ber wê, li kêleka xwe vekir ku ziwa bibe.

Hîn xew ji ser çavên wî neçûbû, lê canê wî nedixwest xew bike. Destê xwe dirêj kir û kêmek berf ji kêşiyê veqetand. Berf bir nava lêvên xwe û bi serê diranên xwe kiritand, li ser zimanê xwe hiland û bi jêrê ve rêkir...

Dawî roj hat û li ser Gelî daliqandî ma. Rojeke wiha germ bû ku dikarîbû serê çûk û keçelan biperitîne. Baş bû ku ew ne keçel bû û bi vê sedemê serê wî nediperitî!

Zaroktiya xwe û hewşa lê mezin bûye anî bîra xwe. Li ber derî bi xaran dileyîstin. Lê ne li ser xaran, ne li ser pereyan, li ser kenêrên qulkirî dileyîstin. Ji bo vê jî ew û birayên xwe dileyîstin. Kê ji kê vexwara divîbû çel libên kenêrên kunkirî ji yê binketî bistenda. Destpêkê deh lib deh lib leyîstibûn, lê dawî kiribûn çel lib.

Çel lib kenêrên qulkirî jî ne hindik bûn. Bes ew tenê dikarîbûn li ser kenêrên qulkirî bileyîzin. Zarokên cînanan nikarîbûn bi vê lîskê bileyîzin û ji ber vê kêmekî temaşe dikirin şûn re, piştta xwe didan wan û diçûn ku leyîstokeke din bileyîzin.

Carcaran têra beniyekî kenêr ji hevûdu dibirin û wê demê êvarî li malê divîbû xurtir, lêztir û zêdetir kar bikin ku para xwe ya rojê xelaskin û cihê vala bûye dagrin. Wê demê yê zêde kenêr bidest xistine jî sistayî dikir û diçû bi xewê dema xwe diborand.

Qulkirina libên kenêrê ne hêsan bû û karekî sebra mezin dixwest. Ji bo vê destpêkê libên kenêrê di nava ava germ de rojekê du rojan radiwestandin ku binepîxe û nerm bibe. Ev libên nermbûyî yek bi yek radihiştinê û datanîn ser paçekî ku dayika wan dirûtibû. Ev jî paçêk qasî kefa destekî fireh û sê-çar tew li hev hatibû pêçan û bi kêliyên mezin qiraxên wê hatibû dirûtin bû. Bi vi awahî paç ne zêde hişk, ne jî zêde nerm bû. Dema lib datanîn ser bi sere tiliya mezin a destê çepê bi libê digirtin û bi destê rastê jî serê dirêjkê datanîn ser nîvê liba kenêrê û dirêjk bi jêrê de didewisand ku qaşûlê ser libê qul bibe. Ev qulkirin divîbû wiha bi hostahî hatiba çêkirin ku dirêjk zêde kûr neçûba. Dema dirêjk zêde kûr diçû yan lib dişkêst an jî kuneke fireh lê vedibû û her du jî nedihatî ecibandî. Ji xwe liba şikestî

divîbû êdî hatiba avêtin. Dema serê dirêjkê kê m hatiba dewisandin jî, wê demê qul biçûk çêdibû û dema bi derziyê darvedikirin, derzî tê re derbas nedibû û gelek caran serê derziyê ji ser libê dişemitî û di tiliya wana re radibû. Ger derzî kûr çûba û ji dil êşiya ba, wê demê bi ser dayika xwe de hildibû û digot; 'Ev çi kenêr in te li sere me kirine bele, dîsa derzî di tiliya min re rabû.'

Lê derzî ne tenê di tiliya wî re di ya dayika wî û birayên wî re jî radibû û di demên wiha gazind fikir de, dayika wî digot:

- "Ma ne tê sibê biçî sûkê û pereyan bixwazî ku xerç bikî? Ger em beniyên kenêran çênekin û nefiroşin, ezê ji ku pereyan bidim te, ezê bi çi her sibeh ji bo taştîya we hêkan bikirim? Bi hêdi dar veke ku derzî di tiliya te re ranebe."

Lê divîbû bi lez dar vekiribaya ku para xwe ya rojane qedandiba; ji ber ku wê rojê, ne kê mî dused libên kenêrên qulkirî jê vexwaribûn... Ber bi nivro ve bê hemdê xwe di xew re çû. Ji xwe hewa germ bû û bayekî tenik, bêhna şînatîyan ji berpâl û navsera zozanan dianî tije kezeba wî fikir. Şînatîya zozanan di vê demê de her bera berfe dida, ango çawa berf dihiliya bilbizêqê serî dida der. Niha li jora Dola Şûminiyê xwedê dizane çiqase guhbizink, qorat û sîrik şîn hatibû!? Niha li jorê berf bi germahiya tîrêjên tavê dihiliya û dilopên xwe yê n biriqonkî diherikandin ser pelên pîvok û kerengan. Mirîşkên kovî li ser berfê digeriyan û li derdora xwe temaşe dikirin. Dema xwe di nava ewlehiyê di didîtin, xwe nêzîkê hev dikirin û li ser deqên bej bera hev didan û diçêriyan...

Piştî demeke din, wê berfa nizaran jî hiliyaba û êdî ji geliyan ber bi berpâlan ve wê giya dest bi stewîbûnê kiribaya.

Xewa wî dirêj neajot; carekê hişyar bû û bi awirên bê wate li derdora xwe nêrî, guhdarî kir. Gelo li çi dinêrî û dixwest çi dengî

bibihîse. Dawî li saeta xwe nêrî. Yazdeh û deh! Nîvê rojê qulipandibû. Yê zêde çûbû, yê kê mabû. Gelo niha Textor li ku derê bû? Wekî dengê wî li ber guhê wî ketibû. Ji bo wê ji xew veciniqîbû. Lê ne kes diyar dikir, ne jî dengê kesekî dihat. Ji xwe ve ronîvroyê kesî dîn tinebû ku were cem. Girê ku dijmin li ser bû, tam li nîvê dolê dinêrî û berpala rêka Dola Şûmîniyê tê re derbas dibû, tev li hemberî vî girî wekî neynikê rêz dibû. Ne mirovek, kewek di rêkê re meşiyaba wê ji gir hatiba dîtin û di wê bêhnê de bi doçka, bîkîsî û hawinan wê ew bifelişandana.

Careke din guh da ser dengê xwezayê û hêvî kir ku dengê ji xwe re dost bibihîse. Lê xweza kerr û lal bibû. Xumîniya dihat guhê wî, kî dizane ji kîjan çaxê, dengên kîjan şeran kîjan çem û lehiyan û zelzeleyan bû? Herdem bi yek perdeyê guhê wî tije dikir. Jê re digot: - “Dengê wiha ji kêrahî dihat û domdar bû ku tirs û xov berdida nava wî; tenêbûna wî pê dihisand û dikir dilê wî bi wî bişewite”.

Pir caran di tarîbûna şevê de, li vî dengî guhdarî dikir û di giştiya xwezayê de xwe bi tena xwe dibihîst ku li derdora wî ne yek dar, ne yek ajal, ne yek mirov hebû! Behrek ji reşahiyê li ber dirêj dibû û ew jî li kêlekê rawestiyabû! Wiha lê dihat ku; bang bike, kes dengê wî nabihîse! Bimeşe, melevaniyê nizane! Paş de biçê, mirin e!

Pêlên avê yek bi yek xîz û beran ji binê lingên wî vedikişînin nava şilahiya xwe. Dişemite û li ber xwe dide. Destên xwe dipelîne lingên xwe li avê dide; lê erd êdî bi tevahî ji bin lingên wî vekîşiyaye û wekî qirşikekî di nava pêlan de diçe û tê. Ax ku melevanî zanîbaya! Lê divîbû berya bikeve nava pêlên behre ev yek hizirîba! Êdî piştî vê bêhnê, wê çawa xwe fêrî melevaniyê kiribaya? Her ku masî li derdora wî diçûn û dihatin, kezeba wî ji wan diqetiya. Li gorî dizanîbû divîbû masiyan zirar nedabana wî. Lê gelo masiyan jî ev

yek dizanîbûn? Heta wekî masiyên Delfîn divîbû rê nîşanî wî bidana. Lê masiyên biçûk, yên devmezin û dirantûj beleya xwe jê venedikirin!

Tîrejên rojê li ser lat û zinarên beralpên Kêlê diterisîn û biriqîneke dijwar dirêjî nava mijankên wî dikirin. Dawî bûkên qehweyî dîsa westiyan û çarîka gewr kişandin ser xwe. Roj hêdî bi hêdî dihat raserê nivê Gelî û êdî tîrejên xwe wekî rimên zêrînî, dirêjî lehiya berfa di Gelî de dikirin. Wekî perperîkên rengîn ku bi milyonan bi hev re ji erdê bifirin, wiha bi coş ji pirîskên berfê tîrejên şikestî bilind dibûn, bi hezaran keskesor li pey hev rêz dikirin...

Dema careke din ji xew veciniqî êdî roj derbasî wî milê Gelî bibû û sî bi tevahî ketibû ser gelî. Ew germahiya rojê şûna xwe dabû hênkahiyekê û tezînokên cemidî bi laşê wî ketibûn. Birîna wî jî, ji hundirû ve dijeniya. Destê xwe avêtyê ku bixurîne. Destê wî ghişt ser şûtika li ser birînê pêçandiye. Wê demê hişê wî nû hat serê wî ku bê hemdê xwe tevdigere. Bêguman xurandina birînê ne hêsan bû û wê di dilê wî de hesret bimaya. Xwest birînê veke, ji bo hinekî bêhna xwe berde. Lê gotina hevalê wî yê textor hat bîra wî û dev jê berda. Berya biçê gotibû:

- “Belkî ez derman bi xwe re bînim. Ji bo wê heta ez vedigerim tu dest birînê nede; ji bo dermanê li ser jê neçe, mîkrob negre!

Gerçî dizanîbû ku niha nême piç ji derman nehiştîyê û tev di nava xwe de fetisandiye lê ji aliyekî jî di xwe re nedidît ewqas şûtik veke û ji nû ve lê bipêçe. Ger di germahiya nivro de baya wê sedî sed di xwe re dîtiba, lê di vê hênikbûna ber êvarî de, tenê dixwest xwe biqijilîne ser hev û guhdariya dengê xwezayê bike. Çiqasî dixwest ku vê bêhnê dengê bilbilê wî dîsa li ber guhê wî biketa!



Her wiha ti caran nebibû bilbilê wî, lê carekê hatibû ser tehta di ser serê wî re û bi awazeke xweş sitranek herikandibû. Ji bo wê jî ketibû cîhana wî û di bîranînên wî de cih girtibû. Deng hîn di hundirê guhê wî de dilerizî û bi vê sedemê bilbil êdî yê xwe didît. Ger li cem ba, yan ne li cem ba çi ferq dikir? Ma bi sedan heval û dostên wî, meriv û nasên wî qey li cem bûn? Na! Wê demê çi ferqî hebû? Ma mirov jî ne wiha bûn? Carekê çav li ruyê spehî diket û dil bera didayê. Pişt re? Qet nedidît! Lê ew rû ew spehîbûn êdî ji dil dervediket û heta şûna wê nehata dagirtin her bi hesret dişewitî.

Hesreta dengê bilbilê dost jî belkî hesreteke wiha bû. Bi strana carekê tenê be jî ketibû cîhana wî û herikîbû nava xwîna wî. Êdî her roj wê girêdan û bêrîkirin zêdetir û diwartir bibaya. Heta ku jibîrkin an têrbûn çêbiba!

Ziwabûnek li ser lêvên xwe bihîst. Lêva xwe ya jêrîn xist nava diranên xwe û zimanê xwe, givaşt û mijt. Di vê bêhnê de nedixwest berfê bimije û tezînokên laşê xwe zêdetir bike. Careke din lêva xwe givaşt û vê carê heta nêşîya dev jê berneda.

Pişt re lêva xwe ya jorîn jî di nava ziman û diranên xwe de givaşt. Devê wî mişt şil bû û têhnîbûna xwe paş de vegerand.

Dawî Roj hilkişîya navsera Kêlê û ber bi nediyariyê ve qulipî. Êdî behneke din, wê stêrka wî diyar bikira û pişt re jî hevalê/n wî hatibaya/na.

Gelo wê textor bi xwe vegeyriyaba, yan hinek heval rêkiribana? Çi ferq dikir? Kî dihat bila bihata! Heta textor nehatiba çêtir bû? Feqîro him westiyabû, him birçî mabû, him jî moralê wî daketibû xwarê. Pêdiviya wî bi rawestîneke çend rojan hebû ku xwe komî ser hev bikraya.

Ji dûr ve dengê kundekî hat, bêdengiya êvarê dagirt. Pê re hişê wî hat serê wî ku cawbarank ne li ser laşê wî ye û ji ber wê tezînok bi laşê wî dikevin. Bi sistbûna xwe hisiyabû, lê bi awayekî pê xweş hatibû û ji bo vê hişyarê di xewê de bû. Bi dengê kund hat ser hişê xwe û nû hişyar bû. Destên xwe dan erdê û laşê xwe rakir, danî kêlekê. Pişt re hinek ava biçûk rijand û dîsa bi alîkariya destên xwe hat cihê xwe. Kefî û cawbarank li ser laşê xwe li ser hev dirêj kirin û pala xwe da tehtê, awirên xwe dirêjî dûrahiyê kirin. Li jor rêka Dola Şuminiyê û di ser re jî parçeyek fireh û şîn ji ezmên xuya dikir. Her du hêviyên wî jî di qonaxa awirên wî de bûn û wê bi hesret li hêviya diyarbûna wan rawestiyaba.

\*\*\*

## BÎST Û ÇAR

Ew şev pirr bi êş derbas bû. Wekî li ser sêla sor be, xew neket çavên wî. Guhên wî her bel bûn û guhdarî li ser rêkê dikirin. Dema lê bû sibeh, nizanîbû şev çawa derbas bûye. Şevêk lê bibû sed şev. Belkî sed caran lempeya saeta xwe pêxistibû û lê nêrîbû. Gelek caran dema di dil xwe de digot; 'Du-sê saet derbasbûne', li saeta xwe dinêrî ku hîn çarîkek derbasbûye yan nebûye. Ji xwe bi tarîbûna şevê re hewa wiha rawestiyabû ku giya nediliviya û germahiyeke fetisokî bandora xwe dabû ser Gelî.

Derketina stêrkan, pîrbûna wan, tava heyvê tev, wekî xeyaleke bê dawî li ber çavê wî daliqandî mabûn. Dilê wî qet rehet nedibû û ji ber vê yekê ne ti xewn dîtî, ne jî tiştêk xeyal kir. Lê di rastiyê de ne wiha bû. Ji ber ku hişê wî ne li serê wî bû, tiştên dianîn xeyala xwe di hişê wî de nediman û ji bo vê jî nedihatî bîra wî. Lê heta lê bibû sibeh bi hezaran xeyal anîbûn ber çavên xwe.

Stêrk yek bi yek vedimirîn û gewrahiya berbangê serî nîşan dida ku ji jorê dengê gindirîna keviran hat. Ji nivşkê ve tezînok bi laşê wî ket û bi ricifandinekê veciniqî. Awirên xwe zîvirandin jorê û guhên xwe bel vekirin. Dilê wî bi lez lêxist û xwest ku rabe ser xwe. Xwîna wî germ bû û leziya. Lêvkeniyeye nediyar ji lêvên wî da ser rûyê wî û çavên wî terisîn.

Hîn berbang ewqasî zelal nebibû ku rê diyar bike, lê di vê bêhnê de careke din kevîr gindirîn. Êdî fikir ku bifire. Ji êvarî ve li hêviya vî dengî bû. Ewqas êşa wî, bêmediya wî, dirêjbûna şevê, derbasnebûna demê, germahiya li ser gelî tev, ji sedema nehatina vî dengî bû û bi hatina deng tev ji holê rabibûn. Heta ji jora Gelî ve bayekî hênîk dest bi herikînê kiribû û bêhna giyayê zahterê jî bi xwe re anîbû.

Neptî deng nêzîktir û zelal bû. Êdî tegihişt ku hinek ber bi wî ve tîn. Dilê wî rehet bû. Kî dihat bila bihata, bes bila hinek bihatana! Bes bila bêdengî bişkesta, bila çavên wî li mirovan biketa; kî dibûn ferq nedikir. Lê bêhtir dixwest saloxekê ji textor bigre. Rêkirina mirovekî bi tena xwe ne baş bû. Yan hirçek derketiba pêşyê? Yan marekî pê vedaba? Wê demê wê wîjdanê xwe çawa bikarîba rehet bikraya? Lê çeka textor li gel bû; dikarîbû bi rehetî hirçê jî, marî jî bikûje û heta dijmin li rastê were, xwe biparezê û dûr jî bixe.

Kêmekê bêdengî çêbû. Êdî dengê ji ber lingan dihat, qut bibû û weke ketibe cihekî çep, an daketibe ser berfê kerr bibû. Gelo çi pê hatibû? Gelo heta niha dengên dihatin xeyal bûn?

Rabû ser kamaxa xwe û berê xwe bi ber gelî ve vekir. Guhê xwe bel kir û xwest careke din xişte xişta ji ber lingan derdikeve bibihîse. Demekê wiha guhê xwe da ser xwezayê û li hêviya hatina dengekî ma. Lê careke din ne deng hat û ne jî kesek ber bi wî ve diyar bû.

Dilekî wî got ku ji tenêmayînê xeyal bihîstiyê, lê dilê wî yê din jî got, dibe ku deng ji ber lingên ajalekê dihat û ajalê berê xwe daye serevrazê gelî û ji ber vê deng qut bûye...

Di navbera her du ramanan de hişê wî çû û hat. Tenêbûn çiqasî zor û zahmet bû!...Gelo niha hevalê wî yê Textor jî bi tena xwe bû, yan gihiştibû hevalan? Ger gihiştiba niha sedî sed wê hinek rêkiribana gel wî û herî kêr ew tenê nedihîşt. Ger negihîştibe? Ger tiştêk bi serê wî hatibe? Ger careke din heval bi ser wana de neyên?...

Di nava van hest û ramanan de pala xwe da ser çenteyê xwe û awirên xwe dirêjî ezmên kirin. Ezman nû şînatîya xwe li xwe dikir û dixwest tîrêjên rojê himêz bike. Piştî şeveke reş û tarî ya bi zor û zahmet derbas bûye, niha şînatîyeke fireh û rojeke nû ya ronî destpê dikir. Gelo ev rojên wî yên wiha bi zahmetî û astengî jî wê wiha weke hilatina rojeke nû bi xweşî û ronahî bi dawî bibana yan wê di nava reşahî û zahmetiyê de fetisîbana?

Lêpîrsîneke hûr û kûr li ser dilê xwe û mejiyê xwe kir... Dikir û nedikir tevî hemû zor, zahmetî û tenêtiya xwe nedigihîşt encameke neyênî û tezînokên ji hêviya jiyanê diafirîn bi laşê wî diketin û xwîn di laşê wî de dicoşandin. Dikir û nedikir nikarîbû hêviya xwe ji jiyanê bibiriya û dilê wî digot; 'yek heval tenê jî ji yekîneyê sax bimîne wê bi te ve were, qet hêviya xwe nebire...'

Di dilê wî de hêvî herdem hebû û bi saya vî dilê xwe yê hêvîdar li ser ruyê erdê, di jiyanê de mabû. Niha tenê bû, lê hêviya wî wêr didayê ku vê tenêtiya xwe bike pêngava berxwedana li hemberî zor û zahmetiyan û rêka jiyanê nû biafirîne. Hêviya wî bi jiyanê nû hebû... Ji vê jiyanê wê azadî hatiba afirandin... Ji vê jiyanê wê hevaltî hatiba jiyandin... Ji vê jiyanê wê hêviyên bê navber ên avakirina

rojên pêş hatibana nexşandin... Ev jiyaneke têr zor û zahmetî bû; lê jiyaneke têr jiyana bû...

Gelo wê ev roj derbas bibana? Kesî bawer nedikir ku wê zindî bifilite! Tenê wî bawer kiribû û hevala wî ya çûye şahadetê baweriya xwe pê anîbû û hêvî dabûyê... Dema ku dil bi dil re dibe yek, bawerî mil dide hêviyê, ma kîjan astengî dikare li ber raweste?

Roja di çepera dijmin de birîndar mabû û hevalên wî tev vekîşiyabûn, tenê bi hêvî û hezkirina xwe ya jiyane û azadiyê zindîmayîn bi vîna xwe afirandibû. Di rewşeke ku herkesî digot, dawîya wî hat de, wî ji nû ve jiyana dabû destpêkirin. Niha ji roja yekem hê zêdetir derfetên jiyane hebûn. Herî kêr hevalên wî pê dizanîbûn ku sax e û li ber keviya berfê ye... Herî kêr textor çûbû ku hawarekê bîne û wî ji vê tengezariyê rizgar bike... Herî kêr niha bintehteke ku xwe tê de bisitiranda hebû... Herî kêr hîn çeka wî li ber serê wî bû û piştî wî li lat û zinarên Kêlê bû. Ew Kêlê ya ji Memê Şivan re bibû kêl û kela, wê zû bi zû rê nedaba ku hêviya jiyane hatiba vemirandin...

Çavên wî bê hemdê wî çûbûn ser hev. Dema bi xwêhdaneke germ a li ser sînga xwe hisiya, bi veciqînekê ji xewê hişyar bû û awirên xwe li derdorê gerandin. Roj qasî du bejnan bi ser bilindahiya çiyê ketibû û tevahiya tîrêjên xwe dirêjî nava Gelî kiribûn. Tîrêjên li ser berfa tije di gelî de diketin, bi heft rengên cuda cuda diterisîn û tije bibûkên çavên wî dibûn... Çavên wî bi germahiya tîrêjan diqurmiçîn û awirên wî dûretir ber bi navsera Kêlê ve hildikişyan... Di terisîna tîrêjan de weke perperîkên ser avê rengên xwezayê tev diketin milên hev û di dîlan û govendeke bi coş de dibûn lehiyek û ji navsera Kêlê heta ber mijankên çavên wî direqisîn û diterisîn. Di nava vê

lehiyê de mil bi mil refên gerîlan dimeşyan û bi alên di dest wan de  
bi ber wî ve dihatin... Dema digihiştin cem, bi lêvkeniyekê radihiştin  
bedena wî û li ser darbesta li ser milên xwe dirêj dikirin...

DAWIYA BERGA YEKEM

Bi Zimanê Kurdî

BIXWÎNE

BINIVÎSÎNE

BIHIZIRE

Zimanê Kurdî

BI KAR BÎNE

FÊR BIBE

FÊR BIKE

ZIMANÊ KURDÎ ZIMANÊ ME YE

ZIMANÊ XWE BIDE JIYANDIN

KU TU BIKARIBÎ BIJÎ

QENDÎL -2007

\*\*

JANA GEL

Ibrahim Ehmed

Wergêr: Elîşêr

STOCKHOLM 1992

APEC

îbrahim Ehmed

JANA GEL

STOCKHOLM 1992

APEC

JanaGel

Weşan no: 1 7

©Utgivare: APECTRYCK & FÖRLAG

ÇAP Û WÊŞANXANA APEC

Nivîskar: îbrahîm Ehmed

Wergêr. EUşêr

Adress: APEC

Spangavagen 345

Box 3318, 163 03 Spanga/SWEDEN

TeL 08-761 81 18 Fax 08-761 42 90

BBN: 91 - 87730 - 12-X

Ibrahîm Ehmed

PÊŞGOTÎN

Plştî bêdengiyek bi çarîk sedsal di cîhana edebiyata

Kurdî de, xwedyê "Yadgar û Hêwa", "Berew Rûnakî" û

"Kwêrewerî", vê carê "Jana Gel" ji me re pêşkêş dike.

Nivîsandina vê romanê diçe digihîje sala 1956'an, demek

ku hîn du sal li ser şoreşa gelê Cezayîrê ya dijî

dagîrkerên Frensî ya ji bo azadî û serxwebûniya welatê

xwe, derbaz nebibû. Lê aloziya zeman wisa lê kir ku deh

sal piştî serkevtina wê şoreşa ev roman jê re hatibû

pêşkêş kirin, bê belav kirin.

Ya rast, berê ku ew rîya ber bi çapxanê bide ber xwe,

çend meh jî li ba min ma. Di vê muddetê de min çend car

ew xwend, car ji carê li min şêrîntir dibû, min xwest di vê

pêşgotinê de çend tişt 11 ser naveroka wê binivîsim, min

çend rûpel reş kirin, min lê nêrî ku vî heqî ez di xwe de

nabînim, ji ber vê min baştir zanî ku vê erka xwe ya han

li ser milê şarezatiya edebiyatê de bikim.

Her çendîn ez di wê baweriyê de me ku nivîskar  
pêwîstî bi nasînê nîn e, lê berî ku ez dawî bi vê pêşgotina  
han a kurt bînim, ez hez dikim tiştek di derheqê wî de binivîsim:  
îbrahîm Ehmed, di sala 1914' an an 1915'an, li bajarê  
Silêmaniyê hatiye dinê. Di sala 1937'an de li Bexdayê  
xwendina hiquqê tamam kiriye. Di sala 1942'an heta  
sala 1944'an hakimî kiriye. Di sala 1939'an heta sala  
1949'an bi hevkarîya li gel mamoste Elaeddîn Seccadî  
kovara Gelawêj li Bexdayê derxistiye. Her li ber vê jî  
naçar bûye di sala 1947'an de dev ji memuriyeta dewletê  
berde. Di sala 1947'an şûn de wekî yek Ji wan serokên  
Partiya Demokratê Kurdistanê navê wî belav bûye.  
Nivîskar, destpêka jiyana xwe ya edebiyatê wekî romantîkek  
şoreşgerî dest pê dike:

"Le ber çawê bed le tirsê bedkar,  
Dil xwom ekeme gorê yadgar,  
Be giryanî woşk be naleyî bê deng,  
Dêynme lertzîn textê kirdgar"

Lê di dawiyê de ew li ser rêbaza realîzmê dimeşe. Bi vî  
awayî em di kovar û rojnamên kurdî û erebî yên Iraqê de  
gelek şî'ir, çîrok û gotarên wî yên cûda cûda dixwînin ku  
yên bi nav û bangtirînên wan ev in:

"Le Wolatê Qaremanan" (1942), çîrokek kurt e, di derbarê  
berxwedana partîzanên Yekîtiya Sovyetê ya dijî  
êrîşên Naziyan a li ser welatê wan e. "Xazê" (1943), "Kwêrewerî"  
(1944), "Kerelotiyê Menûçer" (1945), sê kurte  
çîrokên li ser nalebarîya civak û zehmetdana cotkaran ji  
aliyê derebeg û mirovên dewletê ya li ser dema krallîya



gor bi gor de ne, "Berew Rûnakî" (1945), perçe nesrek xweşik û rewan a derbarê erk û eziyetên têkoşîn di riya azadî û serxwebûniyê de ne .

Di sala 1949'an de riya wî ber bi bendûcanê dikeve, sal û nîv tê de dimîne û "Dwa Tîrî Kewan" dinivîse, tê de êrîşa hukumeta wê demê, nefesa jana ber mirinê ya dawî hesibandîye û mizgîniya nêzîkbûna roja serkevtina bi ser rejima kralî û nûkerên emperyalîzmê de gîhandîye xelkê:

"Kwa Wehrmachtî Elmanî ke etut her zerruwê xwîne?

Kwa Luftwafle ew hêze neparêze merg çêne?

Kwa topî, kwa tankî, kwa ew stolî bê wêne?

Be carê gorê gum bû, liştê wek xwoyê bê ser û şwêne

10

Le layê ême helengûtin yekem hengawî zal bûne,

Le naw boteyî xebata tuwanewe her şertî qalbûne,

Le nûçdan û helengûtin niye bakî gelê Kurdan,

Wekû rêgeyê xebatî xwoyî şikanî toyî le la rûne"

Ji derveyê van di sala 1937'an de bruşora "El Ekrad we El-Ereb" nivîsandiye û belav kiriye ku heta îro jî qîmeta xwe ya wekî programek ji bo rêxistina peywendîya di navbera kurd û ereban de wenda nekiriye. Li ser vê, di eynê salê de ew dane "mehkemê".

Ji sala 1949'an vir ve wî çend şî'ir û çîrokên din nivîsandiye ku piraniya wan heta îro nehatine belav kirin. Bi kurtî îbrahîm Ehmed di edebiyata kurdî de nunerek pêşeng ê rêbaza realîzmê ye û baştirîn nivîsarek nesrê yê li ser dema me ye. Hêviya min ew e ku xwendewanên

hêja ji dîtina berhemên wî yên din bê par nebin.

Kemal Fuad

21/10/1971

11

Bi rûyê xwe yê lawaz û qirmîçî, di beşê pêşî ya otomobîlek de, di navbera şofêr û jendermek zebellah de ew dabûn rûniştandin. Destê wî yê rastê li gel destê çepê yê jendirmê kelebçe kiribûn. Otomobîla wan jî hej û bi leq riya gelek hevraz û nişov a bajêrê "Ç..." girtibû ber xwe. Ew jî bi melhezên bêaram a wekî çerxê di serê wî de bizivire, lê bê ku ew çerx bi tiştê ve bigre yan yek ji wan menzerên wekî sînemayê yên li ser perda hijê wî û li ber çavên wî re derbaz dibûn dîqqeta wî bikişîne, bi wî awayî lê hatibû. Asteng û zehmetiyên diyar û nediyar ên dîwaroj û bûyerên nexweş û bîranînên ji eziyetên rojên borî tejî, di serî de wek vizîniya dengê mêşên hingvînê yên ber kewarê lê hatibû. Êş û arhanek serî girtibû, nedikarî çarek jê re bibîne û ne jî dikarî xwe ji destê wan xelas bike. Heta ew bi rê ketin, bi hejandinek tund a otomobîla wan ve, di eynika pêş şofêr de, wî hêviyek dît. Gurc herdu çavên Kalê yên xweşik dîqqeta wî kişand ku bi hemû endama xwe ve kêmtirîn salên zîndanê tesîr lê kiribûn. Ew çavên bi sedan car di eynika rîkurkirinê de dîtibû ne qet hîssek taybetî tê de colandibû û ne jî qîmetek taybetî dabûyê. Lê vê carê, tiştê ku di wê demê de

pêwistiya wî pê hebû gihîşte dereca herî  
girîngtirîn, ku ew jî xwe nasîn bû. Lê di vir de jî  
bîra wî ya derbeder qet firseta lêkolînek rêkûpêkî

13

nedayê. Herwekî çavên navnîşanek bin riyek  
şaşkirî pê bibîne, wek hukumdarekî birîndar ku,  
di gelek kevin de, tişteke hiştibe bê bi bîrê, berî  
hemû tiştî ew xwe nasîn vê pê da zanîn ku bi lez û  
Eîrozî xwe bigihîne Telarê Blurîn a yadgar, yadgarê  
erî girtin û zîndanê. Lê li vir jî ewqas bi xweşî jê  
re neçû serî, çunkî ciyek taybetî û demek diyar  
wek elektrîkê dilê wî giran fikir ku ew jî guherîna  
eynî cî û dem bûn ku di mudetê jiyana xwe  
ya zîndanê de hewlê ji bîra xwe birinê dabû.

Her çendî nêzîkî deh sal berî qewimî bû, lê li  
gel vê jî gelek bi ronî û vekirî dihatin ber çav û  
nişê wî. Ne herwekî serpêhatiyek do qewimî be,  
ne bigre wekî qewimandinek ku di wê demê de li  
ber çavan biqewime:

Dem dema êvarê bû, li asîmanê aloz û tarî ya  
payîzê, pele hewrên perş û belav dagirtibûn, ew  
mijûlê gogên ji herî (çamur) çêkirinê bûn. Li ser  
erdê jî belgên zer ên ji xwe bêzar ên payîzê ji dar  
û beran diweriyan, bi gufe gufeke gelek bi tore, tuz  
û xubar dirapêçan û didan li ber xwe. Nav û navan  
re jî bêdengiyek bi elem, wek ji gufe gufê bezar  
bibe, xwe li ber pozê pirebayê dida û kip bêdeng  
dikir.

Di xaniyek biçûk li taxa "S..." li bajarê "Ç..." di  
odek sade, pak û xweş ku du pencerên mezin ên  
bi ser bahçeyek biçûk a hîn baş nehatibû rêkûpêk  
kirin û bi belgên zer ên payîzê ve hatibû dagirtin,  
hemû eşyayên odê ji masek û du kursiyên hesin li  
gel eynikek çarçove dar a ku di koşek odê de hatibû  
danîn û nivînek ê li ser erdê raxistîbû, pêkhatibû.  
Jinek xwînşêrîn li ser raketibû, jana eziyetê  
rûyê wê yê geş girj kiribû. Mêrê wê Lawe yê jar li  
ber serê wê rûniştibû, melulî ji çavên wî dibarîn.  
Gelek bi hîşyarî û hîn ji wê jî wêdatir wek destê  
xwe ber bi pelê agirê ve bibe, bi destê xwe yê bi  
pirçê reş wê xew re dibir. Bê niqotandin çavên wê  
yên delalê xweşik ji bijangek şaş ê dirêj ê zivirandî  
pêk hatibû. Dema ku car û baran janê êrîşê dibir li  
ser, wan bijangên zivirandî yên dirêj bi awakî hêdî  
14

li ser çavên wê yên reşê sipehî hildida. Camêr bi  
dengê wek çirpîn nerim ji jina xwe re got:  
"Gelek nema giyana min! Qasek din xwe bigre,  
va demek e, Nazê çûye. Mimkun e dapîrok (maman)  
li ba xwe girtibe, yan mimkun e li mal nebe,  
lê bigere. Bêguman niha di rê de ne..." Lê çi heye  
jinik nîşana bersîva erê yan na dane ciyek, a guhlêkirinê  
jî jê derneket. Lê wisa diyar bû, ev gotinên  
han melulî û çaverêwiya mêrê wê jî kêr nekiribû,  
çunkî piştî vê wî bi awakî gurc got:  
- Baştir ew e, ez bi xwe pê de biçim, ne ku derengtir

biinîninl. Dema ku jina wî van gotinên dawiyê bihîst, bi dengê bilind ê ku jê nedihat hêvî kirin û bi qêjîn got:

- Ne giyana min. meke, min tenê nehêle. Tu herî, ez ê ji tirsan dîn bibim.

Qasek bê deng bûn. Jinikê nefesek kêşa û bi berkenînek eziyet û ne ji dil ve, wek ku ji çavên wê yên reş hîn zêdetir dihat dîtin, heta lêva wê ya hişk a hêşîn zivirî, got:

- Min çend hez dikir kurek me bibûya.

Janê gotina wê di devê wê de birî, dawiyê nefesek kûr kêşa û got:

- Xwedê li me negre. gelek nexweş, e, piştî evqas eziyet û janê ji me re keçek bibe.

Mêrê wê wek nû bi gotina wê bigihîşe, bi toreyyek hişkî sar ve gotê:

- Kur çiyê û keç çiyê? Ez van gotinan gelek ji aqil û hişî te dûr dizanim, wisa dixuyê jan û eziyetê serê te çeliqandiye, Gelo kengî ve tu bi vî awayî bûyî kevnepereşt?

Jinikê kir ku biaxive lê mêrê wê destê xwe danî ser lêvê wê yê hişk û gotê:

- Bes e, tu bi Xwedê giyana min Kalê, bi van cure xeyalan dilê xwe neyxe eziyetê, li ba min her tu baş bibî û zû rizgar bibî, êdî kur û keç wek hev in.

Jinikê wek ku bi gotinên wî bawer neke serê xwe zivirand.

Bi dengek bilind mêrê wê got:

15

- Bi rastî gelek di ser re derbaz bû. Tu tahm tê de nema. Ji tevan baştir ew e, ez bi xwe pê de biçim, ne wek ku em rastî tiştekan bîn.

Jan û arnanê sanciya jinikê hîn zêdetir kir. Di dawiyê de çîruskek xweşiyê jî di çara wê de nehîşt. Diranê xwe yên bi lêvê xwe ve şidandî firseta qîjîniyê nedayê. Xwîdan bi ser çav û milên wê de dilop dilop dihatin xwarê. Dilê mêrê wê givişîn, ketibû nav bêaramî, şerpezetî û dudiliyek tamam. Di odê de, wî dest bi çûn û hatinê kir ku zêdetir ev bi meşek luqluqiyê diçû ne piyasekirinê. Bi ser hev de jî li seeta bi dîwar de hilawêstî dinêriya. Ew ewqas bêsebir bû, nedizanî ku ka gelo seet diçe yan di ciyê xwe de sekiniye. Wî dixwest tiştekan bike. Çi tişt bibe, bi her nîrxê bikeve serî qeyî nake, bi mercê Kalê ji vê jan û ezabê rizgar bike. Lê qet di vê rewşê de nebû. Hingî diçû hîn zêdetir bi şaşîtiya xwe dihesiya, ku çawan Nazê şandibû bi pê mamanê ve û bi xwe neçû û bi firek siwarê erebek nekir û neanî. Niha jî nikare biçê.

Çawan ew niha biçê? Gelo ew ê Kalê çawan mal tenê bihêle û bi teniya serê xwe di nav eziyetê de bigevize û kes nebe dilopek av jî bike devê wê, mimkun e. Çi? Xwedê neke. Mimkun e, belê mimkun e bimre. Hey hawar Xwedê tiştekan wiha pê nekî. Serê wî teqiya... Gelek bi dax û şewitî ji bêdesthilatiya

xwe re kir qîjîn:

- Bi rastî ev jana han tişek bê cî ye û ne rewa ye.

Teh Xwedê çi manek di vê eziyetdanê de heye?

Jina wî ewqas bêtaqet bû, jan û eziyetên çara wê ya tejî bi kul û derd wê ji xew hişyar kir û bi dengê wek çirpîn gotê:

- Ne tu Xwedê, Camêr giyan, gotinên wiha neke.

Çawan ji dilê te tê, tu gotinên wiha dibêjî. Madem wiha ye, bûyîna însanek nahêje evqaz eziyetê? Na, giyana min, zû ber bi şaşîtiyê ve neçe, hatina însanek li dinê gelek ji vê jî zêdetir jan hildigire.

Mêrê wê ji nişka ve gotê:

- Mala bavê te neşewite, niha jî tu ji gotinên xwe yên bicî danakevî, baş e, de bixwe, xwe bigev-  
16

izîne û jan bikêşe.

Bêsebriya mêrê wê gihîşt wê derecê, êdî xwe lê negirt. Biryar da, her çi diqewime bila biqewime, bi xwe biçê bi pê mamanê, bi dengê bilind got:

- Bêguman tiştêk bi serî de hatiye. Nexwo heta niha ew dihatin. Mala wan ji vir her çarîkek-bîst deqîqe ye. Ez ê bi xwe biçim û bi erebek wan bînim û vegerim. Bi tu awayî nîv seetên min pê naçe. Min şaşîti kir, dibû ez zûtir biçim, niha ez ji zû de vegeriyabûm. Dengê xwe nizm kir wek 11 ber xwe ve biaxive: Wiha ye, mirov di halê qewimînê de her jar e. Ji bo çi bi vî awayî serî li min gêj bû? Her bi tevayî ez kerr û kor bibûm. Min wisa zanî

ku her tîk û tenê, ez û Kalê di vê dinê de hene.  
Yan di nav deryayek bêbinî de li me herduyan qewimiye.  
Qet ew cîranên me yên baş bi bîra me  
neketin, ku me ji kê re bigotaya, amade bûn bi  
xwe, jin û keçên xwe ve, bîn li ba Kalê rûnin an  
biçin mamanan li binê dinê jî be, jê re bînin. Dengê  
xwe hinek bilind kir û got: Ez î niha biçim mala  
Mame Reşeyê cîranê me û keça wî ji bo muqetiya  
wê biçînim. A baştir ew e, diya wê bê, mimkun e ji  
mamaniyê Jî bizane. Her çawa be, ew ji keça xwe  
şarezatir e, ew jî nebe yekek din, nîv seetên min  
pê naçe.

Jina wî xwest biaxive, lê mêrê wê guhê xwe nedayê  
û gotê:

- Xwedê li gel te be, ez ê niha vegerim.

17

Camêr bi lez ji mal derket, ket mala Mame Reşe  
de ku tenê dîwarek di navbera wan de hebû. Ne  
mêr û ne 1ê keça wan li mal bûn. Tenê jina xwediyê  
malê li wir bû, tîka Jê kir ku biçê li ba Kalêya  
jina wî ku li ber janê bû û heta ew jî biçê mamanan  
jê re bîne serguhê lê bike. Jinikê bi rûyek xweş ve,  
da xwe biçê agahdariya Kalê bike.

Ew jî bi kelebez ji kolana xwe ya teng derbaz bû.  
Dilê wî bi keser û xweşî, bi hev re, qulpik didan.  
Eva ji bo Jan û eziyeta Kalê, ev jî, ji bo ew zarokê  
ku bibe. Bêguman mesrefek min a baş jî bi te ve  
dê bibe. Bi taybetî eger ji xwe kur be, divê



şahîniyek jê re bikim. Dixuyê ku xwe rizgarkirina ji destê kevneperestiyê giran e. Her gavek berî niha bû henekan bi eqilê Kalê dikir ku kur jê re ji keçan baştir e, ku çî heye va bi xwe Jî fikir bi wê dikir ku eger kur be, şahîniyê dê jê re çêke. Lazim e mirov ewqaz gazind ji jinan neke ku ji keçan zêdetir hez ji kuran dikin. Çunkî bi xwe tahmkirine, dizanin jin, bi taybetî li ba me, çendîn beşxwar, zorlêkerî û bindest e. Ji bo vê hestek adetî ye ku pê xweş nebe, kizîna cîgera wê Ji beşa zêde kirinên bindestiya mirovatiyê be. Lê em, ên mirovên xwendewarên têgihîştî, ji bo çî? Serê xwe hejand û ji ber xwe ve got:

- Ji ber kerîtiya van fikrên min ên bêcî, şert be eger keçek ji min re bibe ez ê şahîniyek ji ya ku-  
18

ran xweştir jê re çêkim. Wî nefesek kûr kêşa û cara yekem çavên xwe li dorûberên xwe gerand. Ew ji koç û şeqaman ecêbmayî ma, ew kolanên êvarên din xelk tê de dimeşyan. Ji tevan ecêbtir ew bû ku ew xelkên bêser û bin tê de derbaz dibûn, di ciyê ber bi malên xwe ve bî hemû bi meşa luqluqiya goran ber bi Deriyê Serayê ve dimeşyan, bi awakî ku ew bi kelebezî û lezkirinê jî nedigihîşt wan. Yek ji nav wan derket ber bi jorê ve kişiya. Her ji dûr ve, ew bi serê xwe yê rût, kurtebejn û qelewiya xwe ve dihat naskirin. Xwedê xêr bike Tewfîq Xire yê casus bi vê lez û bezê bi ku ve

diçe? Yan wekî seyê har bi pê kîjan nêçîrê xistine?.

Lê kes diyar nîn e ku heta nêçîr be. Bêguman diçe hinek malên naskirî kifş bike û heta nîvê şevê Jendirme bavêjin ser. Serê te bi gora bavê<sup>te</sup> û yê axa jî. Ev çi ye, qet rê li ber naçe. - Êvara te baş, kak Camêr. Lez bike mimkun e tu negihijiyê.

- Negihîjim çi?

Tewfîq Xire bi berkeniyek neşîrîn û bi dengê bilind gotê:

- Bi birinc xwarinê, giyana min.

Ji ber rasthatina vî kesî bêmeymenet û pîs, pê lê gelek giran bû. Wî ev nîşanek baş nehesiband. Bedbîniyek ecêb li ser rûnişt. Li milê aliyê Serayê ve dengê gurme gurman dihat. Qasek ew guh lê bû, gurmîna bijî û bimre ya hezaran deng, wek heresê çîyan dihate guhên wî. Bi rastî ev jan girtina Kalê te serxweş kiriye. Çawan di bîra wî de nemabû ku vê êvara han li ber Deriyê Serayê yek ji wan civîn û xwenîşandanan heye ku di bin serokatiya "Partiya Rizgarî" de, di van çend mehên dawiyê de, dihatin meşandiri? Ji bo gihîştina mala mamanê, nêzîktirîn rê û kolan ew bû ku li ber Deriyê Serayê re derbaz dibû. Lê wî çendîn nêzîkahiye li'wê kolanê fikir, boşahiya xelkê yên li ser kolanên wî baştir tê digîhand ku di taqeta kesî de nîn e bikare xwe li wê heşametê bide û bi zû û rehetî bigihîje ew ciyê ew dike biçê. Ew se-

kinî û bi çavek şepûl li xelkê pêşiya xwe nêrî. Te digot, di wê meydana mezin de, xelk wek daran daçikandine, lê ewqas jî bi hereket bûn ku, mirov digot, wek darên ji aliyê bayê şîmal ve bîn hejandin bi wî awayî ne. Bê bizanin ka dê ew çi bêje, ji qêrîn û hawara çepik lêdana xelkê dihat zanîn ku dê kesek biaxiviya. Li gel vê jî, ewqas wextê wî tune bû ku guh bidê. Ew gelek bi lez bû.

Hingî diçû heşamet û boşahiya xelkê li derûdorên wî zêdetir dibû, qasek bi ser de naçe ew jî dê bibe darek çikandî ya wekî wan. Lê ne. Nabe wisa li wî bê. Gelo Kalê ya li ber janê ku xwe givişand û eziyeta jankêşanê de ye û çaverêya vegera wî ye, çend tesadûf dibe heta mamane jê re bibe kurek ciwanok jê re bibe. Çi ye? Qet ecêb nîn e. Gelek jinên koçeran hene ku di rê de zarokên wan dibe. Çawan dibe bila bibe, hewce ye ew biçe pê mamane ve û ew bi zûtirîn wext bi hev re vegezin mal.

Paşe paş ew vegeziya, her çi û çawan bû, bi hezar halan karî sed gavan paş de bê û xwe bigihîne tengavek. Şadî, hêvî û bêaramî wek pelên zêrîn di asîmana dilê wî de vedidan. Lê çavgirtinek zêde pê ve nemabû ku bikare çend gavên Di serbestî bavêje, şirqîn û teqîna şeştîran hemû giyana wî lerizand, ne wek ji tirsan, zêdetir ji şepirzetî û bêçariyê. Bedena Kalê hat ber çavên wî û çawan di

odê de gevz dida xwe, giringiya fermana wî û taritiya encama paşdemayînê, li ba wî bi sedan car ronîtir bû. Bi hemû hêza xwe ve, ew ket banzdana ber bi serê wê kolana ku dikarî bi çend deqîqek jê derbaz be, ji bo hatina ser wê şeqama diçe mala mamane, lê mimkun e ew jî îzdîham be. Baş e, çima neçe pê mamane din, lê kî dinase? Eger naçarî nebe, qey niha gerîna li pê xelkê ye? Dûr nîn e di vê têkelhevî û aloziyê de, Bacî Pîroz jî li gel neyê, wek ku nasê çendîn sal a malbata xwezûranê wî ne, ji ber vî wext û zemanê derbeder bike. Bêguman, di rojek wiha de, mamane nenas derî jî jê re venake.

20

Teqîna nû yên şeştîr û tivingan, zincîr û qeydên melhezên wî qetand. Ewqas bi ser de derbaz nebû, hîsa tirpîna piyên bi lez di pê xwe de kir. Dema ku ew vegeriya û li paş xwe nêrî, dît ku beşek ji xelkê civînê yên hatî belavkirin di pê wî de ne, çend gav tenê mane ku bigihîjinê û jê jî derbaz bin û vê riya tîk û tenê jî lê bigrin. Çavên xwe kir erdê û hemû hêz û taqeta xortîniyê da li ber lingên xwe, lê hîs dikir ku xelk nêzîkahiya lê dikan. Ewqas tirs li ser rûniştibû, bi awakî wisa dimeşîya, te digot qey ew xelkê pê de ji bo girtina wî yan ji bo kuştina wî pê ketibûn. Lê beyhude bû. Wî bi çavek bêhêvî lê dinêriya. Va hinek gihîştinê û dikan jê jî biborin. Şirqîniyên şeştîran II nêzîkî

Silemandî ve dihatin û mirovek bi qêrîn û hawar ve li teniştâ wî ket erdê, nexêr birîndar ji yek û diduyan derbaz bûn. Serê xwe bilind kir ji bo li wî ciyî bigere ku şeştîrê cî kiribûn. Li ber percerek bin xaniyê kitêbxana giştî de, yanî di koşa kolanê de serê jendirmek dihat xuyakirin. Bêtirs wî lûla şeştîra xwe ber bi xelkê de kiriye û car û baran ber bi şeقامê ve gulandîreşîne, vêca kî ber ket ew şans û bextê xwe. Qasek wê de jinek çîpilê zarokek girtibû dikêşa û bi qêrîn ket erdê. Şeştîr bê deng bû, jendirmê serê xwe bi ser de xwar kiribû û êdî nediteqand. Tu bêjî, gelo kuştina jinika bêguneh û hawara zarokê dilê wî şewitandibû? Yan jî hesaba problema di navbera wijdan û bêwijdaniyê dest pê kiribû. wisa diduliyek dihat dîtîn. Ewqas nêzîkî wî bû, eger tabancek di destê wî de hebûya kasê serê wî radikir. Ne dizanî ev dijminatîya tund, dijwar û bêzept û rept ji ber wê zordariya bêhed û hesab û aşkera bû ku wî didît, an ji bo xwe rizgarkirina ji wê tirsê bû ku êrîşê li ser jiyana û encama wezîfa wî dikir.

Her çi dibe bila bibe, niha wextê lêkolînê nebû, ji neteqandina jendirmê îstîfade kir û xwe qulupanî û gêrkinê ve gîhand li ba wê dîwara ku şeştîra jendirmê jê nedigirt. Lê wî hê xwe negîhandibû wî mifê û bi xweşî û rizgarbûnê şa

21

bibe, dît ku Jendirmek li ber dêza guniyên ku li

ser banê mizgeftê û li hemberê kitêbxanê danîbûn  
û xwe li ber xwar dike û tenê nêzîkî bîst gavan di  
pêşiya wî de ye. Wî bîhna xwe veda, nedizanî ka dê  
çi bike. Biçûya li milê din şeqamê diket li ber  
nîşana Jendirmê li ber pencera kitêbxanê, paşe  
paş vegeya heşamet û boşahiya xelkê lehiyek  
wisa rakiribû ku firseta paşde vegeyînê nemabû.  
Wî bi tirs serê xwe hilda, li serbanê hemberê xwe  
nêrî. Wî dît ku jendirmê lula tivingê ber bi wî de  
dirêj kiriye. Hemû laşê wî bû çav û ew jî li ber tivinga  
jendirmê bû ku mirina ji kûna lula wê di bizava  
dîtina wî de bû, nedizanî dê çi bike, rûne?  
Biçe? Tu firsetek jê re nema. Her hîç. Her tenê  
ew jê hat û destekî xwe ber bi lula tivingê ve bilind  
kir, wek ku bixwaze li ber xwe bide alîkî.  
Tirsê ewqas xwe lê nêzîk kiribû, ji wî wisa bû ku  
destê wî digihîjê, yan her ji tirsan û ji ber  
şepirzetyê bêşuur wisa dikir. Teqînek hat guhê wî  
û kip bêdeng ma, hestê germahiyek di laşê xwe de  
hîs kir, lingê wî giran bû û giran bû. Ewqas giran  
bû, çendîn taqeta wî heye da li ber xwe, lê feyde  
nekir. Dinya diyar û nediyar, di dorûberê wî de, di  
nav mij û muranê de, wek lula tivingê bi temamî  
gewr, hat pêş çavan ku çiqas diçû, wek leza  
birûskê biçûk dibû, dema ku ew jî nema bi tevayî  
ew ji hişî xwe çû. Tenê tiştê di hişî wî re derbaz  
bû, rengê Kalê û daxa ku ji dilê wî demeket, hesreta  
pê negihîştinê bû.

Camêr bi van melheze û fikran gihîşt wir, navek re tevizînek wisa di laşê wî de hat xwarê ku bi yekcarî zincîrê bîranînên wî qetandin. Êdî Ji wir şûn de bi mat û xemgîn çavên xwe kir rê û heta gihîştin bajarê "Ç...". Ne ew menzerên xweşik û sipehî yên li ser rê û dirban li ber re derbaz bûn dîqeta wî kêşa, ne asoyê bîranînan Jê re peyda bûn ku wekî girûfê rîsên aloz lêhatibûn.

Ew li ber derê dayîra asayîşê sekinîn. Birin hindûr. Piştî çend seetek nexweş a gelek bêzar, rêçên tiliyan û çend wênên wî girtin, navnîşan, kar û navên çend kesê nas û xizmên wî yên nêzîk jê pirsîn û nivîsandin. Tembîh kirin ku bê berî wan agahdar bike, nabe bi tu awayî ciyê rûniştina xwe biguhere. Bi vî awayî ew azad fçirin.

Dema ew ji dayirê derket derve, bahula xwe ya teneke ya biçûk ji destê xwe danî erdê, li derûdorên xwe nêrî. Yekem car, piştî deh salan, xwe bi tenê û bi nêzê serbestiyê û bê jendirme di pê de û qeyd di destan de dît. Gelek bi nefesek kûr û dirêj hewayek paqij mijand. Berkenînek ne ji dilj qasî çavgirtinek, bextê wî yê reş û tarî ronî kir. Edî bi xemgîn û bê aramiyek gihîştina Hêwayê kurê wî û Kalêya jina wî hemû tiştan ji giyan û hişê wî veşart. Heta ew guherînên zêde li ser cadde, xanî û dikanên vî milî û wî milî çêbibûn, ewqas piçek jî bibe dîqeta wî bikişînin yan guhê

xwe bide wan menzerên renga û rengîn ên li ber  
23

bûn ku caran dilgirtirîn menzere bûn li balê û wek  
rengê avabûna rojê kulîlk û binevşên biharê yên  
xweşik bi ser de rakêşabûn, serê xwe daxist ber  
xwe û çavên xwe kirin rê, bê ku tiştek taybetî tê  
de xuya bike, meşiya. Bi gurr û geşî ku qet ji laşê  
wî yê jar nedihat hêvî kirin, ew ber bi mal de diçû.  
Melheza wê matî, xweşî û geşiyê fikir ku bi nişka  
ve bi ser mal de bigre û bêxe dilê kur û jina xwe.  
Lê bêguman Hêwa wî nasnake û dê xwe jê dûr  
bigre, bi heyrî û rikoyî dê binêre vî mirovî rian ku  
dike wî maç bike û destê xwe têke milê dayîka wî.  
Li ber çavên wî re derbaz bû ku Kalê bi dengê  
nizm û bi barîna hêstiran ve gazî bike. "Were,  
Hêwa giyan, ev e bavê te ye. Dê ka destê xwe bavêje  
milê bavê xwe, maçîkek bidê." Ew bi didulî û  
nîv rizayî û ew jî bi coşî û xemek zêde ve nêzîkî  
hev bin. Hêwa destê xwe yên biçûkê nazik bavêje li  
ser milan, ew jî devê xwe têke nav çavên wî, berî  
bikeve mijînê, têr û têr bîhîn bike. Lê Hêwa zarokek  
biçûk nîn e, temenê wî deh sal e, bi hemû  
tiştî digihe. Bêguman dayîka wî jî ewqas behsa wî  
jê re kiriye dema ku çavê wî pê bikeve dê êrîşê  
destê wî bike û maçî bike. Lê ne, ew ewqas guheriye,  
mimkun e Kalêya belengaz bi xwe jî wî nas  
neke. nexwasma li ba zarokek wekî Hêwa. Di vir  
de, ew gihîşte ser wê kolana ku dibû vegere ber bi



mala wan de, gelek req sekinê û di ciyê xwe de  
hişk bû. Mala çi halê çi? Mal li ku maye? Hat bîrê  
ku gelek mêj de pismamê wî Lawe jê re nivîsîbû,  
jin û kurê wî biriye ba xwe û odek daye wan û xaniyê  
wan jî ji wan re daye bi kirî. Ji kiryê mehê du  
dînar jî jê re dişandin û ewî jî li xwe serf dikir.

Her ev bîrketina han a ji nişkave di xeyala wî de  
be û qamê wî şikandibe, hêz û taqet di laşê wî de  
nemabe, dema ku ew paş de veşeriya, lingên xwe  
di pê xwe de kaş dikir. Yanî bi yeKgihîştina.hevûdu  
qet ew tahm û xweşî Jê dernakeve ku van her şeş  
mehên dawî yê zîndanê de xwe Jê re amade kiribû  
û xeyalan li ser danîbû. Li ber çavên Lawe, jin  
û zarokên wî dê kengî rûyê wî bigre wan tiştan

24

bike û wan gotinan jê re bêje ku di dilê wî de lê  
didan? Qet.

- Tiştê aşkera ye ku heta ez nikarim maçî jî bikim.  
Dê qey çi bike. Dinya her ew çend deqîqe  
nîn e ku yekem car tê de ye. piştî deh salan,  
çavên wan bi yekûdu dikeve, jiyanek dûr û dirêj  
pêşiya wan e, tenê Xwedê ji qeza bela û musîbetên  
dinê biparêze, lê gelek ecêb e, çawan ji bîra wî  
çûbû ku ew di wê malê de nemane. Berî çend salan  
bû, Lawe di namek xwe de behs kiribû ku  
Hêwa û dayîka xwe li mala wan in û bi hev re dijîn.  
Rast wî riya malê girt û heta gihîşt ber mala Lawe.  
Piştî qasek bêdengiyê bi destek lertzok li derî xist.

Piştî demek baş kurek heşt-neh salî derî Jê re vekir.

Dema ku çavên wî pê ketin. dilê wî avêt, tu bêjî ev Hêwa be? Bi rastî îhtîmalek gelek nêzîk e ku ew be.

Bîçima wî gelek li wê wêna Hêwa diçû ku di zaroktiya wî de hatibû kêşandin, ew wêna nazdar, piştî gelek rîcayên Laweyê pismamê wî bi xefa desthilatdarên zîndanê gîhandibû destê wî. Ew wêna çendîn sal dema ku şev bi ser de dihat ji betanê lehêfa xwe derdixist û heta xewa wî bihata wextê xwe pê derbaz dikir û bi wê tîrêja geş a hêminê paqij ê çavê reş henekan dikir û tarîtiya zîndana xwe ya reş pê ronî dikir. Hîn dinya tarî û şev bû ku dema ji xew hîşyar dibû, cardin di nav betanê lehêfa xwe de baş diveşart, ji ber wê ku wek wêna Kalê, gardiyanên hov ên zalim ên zîndanê, di lêgerînek nişka ve nebînin û li ber çavên wî wek wehşan perçe perçe nekin. Dê çendîn tesadufek xweş be ku Hêwayê giyan yekem çareya naskirî be ku li bajarê "Ç..." çavên wî pê ketibe.

Zarokê, bi bêdengî. bi dîqqet nêrîn û ecêbmayîna "mirovê" bi endazek perîşanî, dikir deriyê li ser bigre û Camêr jî ji ber xwe ve digot: Hêwa! Hêwa! Zarok zêdetir zer bû û hingî diçû nîşana tirsê hîn zêdetir li ser çav û rûyê wî digirt, bi taybetî dema ku dît mirovê derî girtiye û nahêle pê ve bide. Bi dengê gelek bi tirs nezîkî hawarê ve got:

25

- Tu ji bo çi naaxivî mamo, bêje, te çi divê.

Vê pirsar han Camêr ji çengê şepirzayetî û melhezê rizgar kir, bi hêdîka ve, bê ku çavê xwe ji kurikê bide alîkî, wî pirsî:

- Kak Lawe li mal e?

Zarokê bi deng gotê:

- Ka ez biçim bizanim.

Bi tundî, bi hemû hêza xwe ve deriyê pê ve da û Camêr bi perîşanî û şermezarî ji der ve hîşt û bi xwe jî bi bez ber bi mal de hat.

Camêr, piştî dengê gurmîna derîpêvedana zarokê biçe guhên wî, piştî xwe da derî û mat û bêdeng sekinî. Wî hez ji deriyên pêvedayî nedikir, ger ku ew ji derveyê derî jî bibe. Wisa dixuya deh salên bendîxanê, deh sal jiyana nav zîndana derî bi ser de daxistî, tesîrek xerab li ser hijê wî kiribû. Çend deqîqek bi vî awayî mayîn, li ba Camêr Ji çend seetan derengtîr derbaz bû, tirpîna rêveçûnek hinek giran nêzîkahiye lê kir û derî vekir. Laweyê pismamê wî, weki deh sal berî niha çawan di cî de hiştibû her wisa sor, spî, kişt û rû geş bû. Di valatiya derî de sekinî, tenê guherînek ku Camêr di ser û çavên wî de dît ew bû ku çend mûyên spî pekîbûn cênîkên wî, ewan jî di nav mûyên reng xurmeyî de bi şermokî xwe diveşartin. Lawe bi rûyek hinek girj ve lê nêrî û bi dengê bilind jê pirsî:

- Ha bira te çi divê? Emrê te, daxwaza te?

Camêr bi ecêbmayî ma, bi berkenînek êş û elem ve ku tenê ji bo wê bû ku şermiya xwe jê bide veşartin, gotê:

- Kakê Lawe. çawan? Tu min nasnakî. Ez Camêr im. Wî hê gotina xwe tamam nekiribû ku rûyê Lawe mîna pêlek şadiyê geş bû, bi dengê gelek kul û xem û daxwazek gelek bi xweş û girîn ve gotê:

- Way Camêrî giyan. Li min bibore bi rastî min te nas nekir.

Destên xwe kirin milê hevûdu û vî milî û wî milî hev maçî kirin. Lawe destê wî girt û bir oda  
26

mêvanan. Bi awakî gazind jê re got:

Axir kekê min, nedibû tu me bi hatina xwe agahdar bikî. Çima bi vî awayî nişka ve dikevî mal de. Ev kar e?

Camêr got:

- Tu bi xwe jî dizanî ku mehê carek li bendîxanê musaede dikin mirov name bişîne ji kes û kûsên xwe re. Min jî nivîsandibû ku ez ê di vê meha han de rizgar bibim, êdî bi tamamî min nedizanî li ku û kengî dê min berdin heta ku ez we agahdar bikim. Baş bû Xwedê rast anî, di vir de şansê min yawer çû ku wan bi xwe bê rîca û lava anîn li vir. Pişt re ger min bizanibûya jî min we agahdar nedikir ku hûn bikevin nav zehmetî û eziyetê û bên pêşiya min. Lawe gotina wî di devê

wî de birî û bi berkenînek tahl ve gotê:

- Ne bavê min, pêşî hatina çî? Wisa dixuyê, haya te ji dinê tune, ma ji tirsî jendirman kesek dewêre derkeve der. Mimkun e ji deh kesan kesek ên ku te nas dikin li bajêr nemabin. An ew hatine girtin û birine kirine zîndanê, yan lê xistine derketine çîyan. Li ser emrê fermandarê giştî nebe, nabe ji sê kesan zêdetir bi hev re bigerin, bi şev 1ê ji seet heştî êvarê û heta şeşê beyana sibê çûna derve qedexe ye. Li gel van tevan jî, van hemû fermanên nerewa tesîrê nekiriye li ser aktîvîta eskerên azadîkirina welat ku "L.A.N" Jê re têt gotin. Kê şev heye neavêjin li ser bajêr û roj jî nîn e li kolan û koçan çend teqîn û narincokan neavêjin û ziyaneke zêde li mal û canê dijmin nedin. Lawe van gotinan wek lomeyek gelek bi lez ji Camêr re gotin, lê wî bi awakî bêzarî jê re got:

- Tu carek dev ji van gotinan berde. Min ewqas van cure gotinan bihîstiye guhên min teji bûye. Çima tu bangî Hêwa û dayîka wî nakî, ev çî ye, mirov dibêje mêvanên jina te hene, te ez anîme vir? Lawe, wekî ji nişka ve gelek bi bêînsafî birînek wî bê kolandin, rengê wî bizirî, gorîzî, êş û arhanek bi eziyet bi laşê wî de hat xarê, lê dema ku serê xwe hilda, dît ku çavên Camêr melûl bûne.

27

xem û hevî jê dibarin. Her çendî hêz, qudum û taqet di giyana wî de hebû da ber xwe, ji bo ku bikare

çirîskek ronakî û xweşiyê bixe ser rûyê xwe,  
lê gelek zû pê hesiya ku ev hewildan û berxwedana  
wî beyhude ye, bi awakî zîrekî gurc destê xwe avêt  
çimikên gotîna Camêr a dawiyê, gotina wî tesdîq  
kir û bi dengê bilind ê lertzok ve jê re got:

- Malek cîranên me mêvanê me ne, ca ez biçîm  
çarek lê bikim. Lawe dema ku ji ba Camêr derket  
derve, nefesek baş sitend, di salonê qasek sekinî  
ku heta hinek reng û rûyê wî bîn bi ser hev, pişt  
re çû oda zarokên xwe. Xeberê hatina Camêr  
gîhand wan û Ji wan re got ku ji wan re çayek  
çêkin û xwarinê jî ji bo herdukan amade bikin.  
Hemamê jî ji bo Camêr germ bikin. Qasek çavên  
xwe li odê û ser û çavên zarokên xwe gerand, hîşê  
wî ewqas mijûl bû ku tişteki jê re baş nedihat  
xuyakirin, nedizanî ka dê çi qas bi vî awayî bimîne,  
eger jina wî negotibûya:

- Madem wisa ye ka ez biçîm xêrhatiniyê pê bidim  
û bangî vir bikim, ji bo çi li dîwanxanê be.

Her dibû di serî de bihataya vir, ma ew xerîb nîn  
e, kî ji me heye ku jê şerm bike?

Lawe, wekî ji xew hîşyar bibe, ji jina xwe re got:

- Ne neçe. Tu neçe. Were carek ez gotinek ji te  
re bêjim, wê çaxê ez ê bi xwe biçîm bînim vî milî.  
Jina xwe da aliyek, çend gotinan çirpande gunên  
wê û ber bi oda mêvanan ve çû.

Dema ku Camêr bi teniya xwe di odê de ma, li  
gel wan hemû dax, xem û melhezan jî nekarî

dîqeta xwe ji raxistin û navmala ciwan û rêk û pêk a giran a derûdorê xwe bide alîkî. Di dilê xwe de digot: Bêguman niha halê Lawe gelek baş e, ez jî tûşî wê muşkilê nehatibûma niha hal û malek min a baş hebû. Lê wisa dixuyê min nedikarî, ez wek Lawe bibim, ew zîrek bû gelek bi zû xwe ji bend û bayê mamostayetiye rizgar kir. Gelo niha bi çi mijûl e? Ger ez jî nehatibûma girtin û di wextê xwe de xwe pêş bixista, niha mehanyek min a baş hebû. Ya herî ecêb ew bû ku min dihesiband ku ez 28

ê bêm ser serwet û waridata bavê xwe, heta niha min qet bi wê yekê nefikiriye ka gelo ez ê bi çi bijîm. Ji xwe memuratiye ew qet, li gor baweriya min quruşek nake. Xema dîtina Hêwa û Kalê hemû tiştêk 1i bîra min biriye. Bi van xeyalan cardin hat li ser behsa Hêwa û Kalê û cardin hemû tiştên ji bîrê çûyî, bi bîr anî û aramiyê li ber birîn.

Dema Lawe hat oda mêvanan, dît Camêr destê xwe li pişt xwe alandiye û wek banz bide di nav odê de tê û diçe. Li ba Camêr wisa bû ku Lawe çûye 11 ser mêvanê xwe yadest bigre û wî bibe milî din an kur û jina wî jê re bîne vî milî. Dema ku dît bi tenê vegeriya, bédeng li ciyê xwe rûnişt. Wî berê xwe da Lawe, bi dengê bilind -ku ne rêk û pêk û bê cî hat gohê wî jî- got:

- Gelo tu ji bo çi çûyî milê din? Te ji bo çi zarokên min neanî, ez xwe lê nagirim heta ku mêvanên

te biçin.

Lawe jî gelek bi hîşyarî, lê bi renekî zer, dengekî bilind ê lertzok got:

- Carek tu rûne kekê min, bîhna xwe vede, em ê nan bixwin, xwe bişo û rakeve vêca..

Camêr bi hêrs gotinê di dev de hîşt û got:

- Bîhndana çî, nanxwarina çî û razana çî? Ez ji bo van tiştan nehatime vir, ez Hêwayê xwe dixwazim. Hêwayê kurê xwe. Ez dixwazim wî bibînim.

Ewî bidim ber himbêza xwe, têr 'têr maçî bikim. Ji nişka ve deng lê hat birîn, girînê gewriya wî girt û wek hêviyê jê bike got: Giyana min, kekê Lawe.

Henekan meke. dilê min ewqas birîn e. bi benikên zirav ên rizî hevgiytiye, ez li ber van cure henekan nadim, wisa dixuyê dinê wêran jî bibe, tu dev ji henek û laqirdiyên xwe bernadî. Zarokên min li ku ne, bangê wan bike. Ji xew, ji xwarin, ji hemû tiştek dinê hesreta wan, bîriya wan û hez bi dîtina wan dikim. Her çendîn ev êrîşa Camêr a ji nişkave dilê Lawe givaşt, lê xwe girt û bi hîşyarî jê re got:

- Giyana min, wisa dixuyê, tu baş bi gotina min negihiştî yan min nekarî ez baş te bi rastiyê big-  
29

ihînim. Mesele henek û laqirdî nîn e, Hêwa û dayîka xwe li vir nîn in, ji ber vê min ew neanîn ba te.

- Ê baş e, li ku ne, çûne mala kî? Bişîne pê wan



ve.

- Va Ji mehek zêdetir e çûne gundê Gulan mala xaltiya xwe.

Camêr bi qêr got:

- Baş e niha çare çi ye? Ger wiha be, ez nikarim bibînim?

- Çare tenê ew e ku wek min ji te re got, wisa bikî, nanê xwe bixwî, xwe bişoyî û rakevî, serê beyana sibê em ê yekî bişînin pê wan.

- Dibû te ji wan re bigota, ma qey ew ewqas gêj bûn, bi taybetî ku wan dizanî, ez ê vê meha han ji zîndanê derkevim.

Her çi û çawan be niha çare nîn e, hewce ye, ez bisekinim heta sibeyî. Lê beyana sibê, ez ê bi xwe biçim pê wan.

Lawe wekî ku reş û muranek wî bigre, piştî demek baş, got:

- Ez qet bi başî nizanim ku tu bi xwe di pê wan de biçî, dinya aloz û têkel e, tu bi xwe jî vaye tev li ser hev du roj e ji zîndan rizgar bûyî. Xwedê neke, toşê belayek bê, vê carê dê tu bi serê xwe ve tê de biçî.

Camêr qasek bêdeng bû û serê xwe hejand û got:

- Tu rast dibêji, ji xwe ez nikarim bi bê agahdarîkirina dayîra asayîşê ji ciyê xwe bileqim, ji bilî vê, Xwedê dizane ka ew musaeda min dikin an nakin.

Baş e, kîjan xêr e bila ew be, çare nîn e, tu

yekî bişîne, lê bi zû, tu dixwazî niha de bikeve pê,  
belkî bi şev bikeve rê.

- Ey giyana min, min ji te re got, bi şev çûyîna  
derve qedexe ye. Gazîno û çayxane nîn in û mirov  
nikare kesek bibîne. Ji derveyê vê beyana serê  
sipê berî seet şeşan kesek nikare ji mala xwe derkeve  
derve.

- Tu rast dibêjî kak Lawe, gotina te ye, li min

30

bibore, bi rastî xem û bîra Hêwa wisa li min kiriye,  
agahê min bi tu tiştek nemaye. Lê giyana  
mîn, sfbeyî zû yekî baş bişîne pê wan. Bavo, ew  
çiqas dixwaze tu du ewqas bidê, ez şûnde didim,  
her wî mêranyê ji me re bike û zû biçê û zû wan  
bîne. Wan tenbîh bike ku ew li rê, li tu ciyê nese kinin.

- Perê çi kekê min? Tu şerm nakî, navê peran  
tînî. Carek hemû bi ser hev li vî karî yek-du dînar  
naçe ku qet kemalek wî nîn e, derveyê vê, ger em  
bi ber te de hezar dînan serf bikin cardin em di  
bin qenciya te de dernayên, te di riya welat de  
dest ji jiyana xwe berdaye, zîndan dîtiye û bi salên  
salan te ji mal û zarokên te dûr xistine. Te ji  
xweşî û azadiyê dûr kirine. We serê me bilind kiriye.

Ji derveyê vê, tu pismamê min î, kes û kusê  
min, perên min 1i kî re ye, eger ji te re nebe.

Camêr bi awakî şermezarî gotê:

- Baş e bavê min, tu bi xwe çawan baş dizanî  
wisa bike, sipas.

Lawe bi berkenînek şewqet ve got:

- Dê baş e, ka ez carek biçim binêrim, gelo ji te re şîv amade kirine yan ne? Ez gelek birçî me, bêguman tujî.

Gelek bi ser de neçû, Lawe vegeriya ba Cemêr, hinek bi şermokî ve jê re gotê:

- Mixabin şîva me layîqê meclisê nîn e, tenê hinek xwarina ji nîvro de mayî heye, lê min ji wan re got hêkerûnek jî ji me re çêkin û di oda xwe de ji me re deynin em ê li wir bixwin. Zarok jî li wir in, hez dikin te bibînin.

Gotina zarokan li ser Camêr, yekî wek kew ji destan firî be bi wî awayî tesîr kir, piştî bédengiyek dirêj, vêca hat bîrê ku divê biaxive, wê çaxê jê re got:

- Hêkerûn ne pêwist bû, malhaziriya hebû, bes bû. Tu bi xwe dizanî her di berî ve ez ewqas çil nebûm, di zîndanê de jî ewqas fasulyên spî, pîvaz, xwarina şeliman û nokan dan me, bi kêmasî ber hemû xwarinek re cardin ew hebûn.

31

Dema ku çûn şîv xwarinê, du jin û çar zarok di odê de bûn, wisa dihat xuyakirin ku jinan xwe ji bo xêrhatina Camêr amade kiribûn, bi ber ve rabûn ser piyan. Jina Lawe bi dengê aza û berken û jina din jî bi dengê şermokî, xêrhatinê "kak Camêr" dan. Çar zarokên wî jî, yek ji wan şîrmij bû û di dergûşek de dirêj kiribûn û li gel du keçên heştne

salî laqirdiyan dikir. Zarokê çaran jî ew kur bû  
ku di dema derîvekirinê de Camêr wî şubhandibû  
Hêwayê kurê xwe. Ew jî bi dudilî û şermokî ve ber  
bi mamê xwe Camêr ve çû û destê wî maçî kir.  
Paşde vegeriya ba dayîk û xaltiya xwe, ku ew bêdeng  
ji dûrî wê ciyê Lawe û Camêr ji bo nanxwarinê  
rûniştibûn, li dorê semawera zer bûn. Yek ji  
wan pufê semawerê dikir û ya din jî şuşan 11 ser  
sîniyê rêz dikir. Lawe yek bi yek navê zarokên xwe  
ji Camêr re got, vêca wek henek got:

- Ji xwe pêwîst nake, Nazdara xêzana xwe û  
xwîşka wê Behiya bi te bidim naskirin?

Camêr dema ku navê Behiya seh kir, wek tu tasek  
ava sar di serî de bikî, çawan ew Behiya şûx û  
şeng a wek pelên gulê bi rûmet ku piştî deh sal  
mêrkirinê 1î sipehiya bajêr dihat hesabandin, ketiye  
vî halî û çavên wê çûne kort û wek îskelet  
çerm û hestî maye.

Camêr nekarî xwe û hêdîka ve ji Lawe pirsî:

- Erê bi rastî ev çima wiha li Behiya hatiye?

Lawe bi serhejînek ve gotê:

- Eger bê'ar nebûya, ew evqas Jî nedima. Da vêca  
em nanê xwe bixwin pişt re ez ê behsa wê ji te re  
bikim. Ez naxwezim ji niha de dilê te biêşînim.

Dema ku em biçin oda te, her li ser piyan, ez ê  
behsa Behiya ji te re bêjim, çunkî wisa dixuyê tu  
acizbûyî û xewa te tê, derveyê vê hewce ye, berî  
raketinê, tu xwe bişoyî.

Piştî nanxwarinê ku Lawe bi zor jî be, nekarîbû Camêr bide axaftin, ew rabûn. Lawe, Camêr bir û oda wî da nîşan, li ser piyan behsa Behiyayê jî jê re got ku çawan di xwenîşandanek niştimanî de kurê wê yê yekane hatiye kuştin, bavê wî yê kal jî agirê cîgerê dikeve pêşîra wî û diçe emnîyetê kurê xwe bipirse. Dema ku ew digihîje ber deriyê emnîyetê dibîne xelkekî zêde yên wek wî diçin Ji bo dîtî û wergirtina laşên kes û kûsên xwe. Hemû li ber deriyê emnîyetê ya girtî de disekinîn. Gelek bi ser de derbaz nabe, derî ji wan re heta serpişt vedikin, dema yekem kesî dawiyê jî derbazî hindûr dibe, derî xirp bi ser wan de digirin û her yek ji wan sê sal hukum didin wan. Berî beyana sibê, berî ku xelk ji xew hîşyar bin, bêdeng û hîs dişînin zîndana "N...". Mihîyê Awel -zavayê min- gelek bi ser re derbaz nabe li ber eziyet û îşkenca zîndanê nade, salek di bendîtîyê de derbaz dike û pişt re emrê Xwedê bicî tîne.. Tu bi xwe jî dizanî, ew kesî roj peyda neke, nikare bi şev jî bixwe, vêca ev çend bûyer û eziyet bi serê Behiyayê de hatine, gelo ecêb nîn e ku hê hestiyê wê jî mane? Kekê Camêr. Qet nepirse ka ev xelkê han di çi halê de dijî, kesek xwediyê serbestî, jîyan û namusa xwe nîn e, bi durûyî nezane ku ez bêjim: hûn ên bendîxanê ji me yên der ve azadtir û dilhêmintir bûn. Tu bawîşkan didî, xewa te tê.

xwe bişo û rakeve. Şeva te baş.

Camêr gotê:

- Ji te re jî..

Lawe çend gav dûr ket û vegeriya û jê re got:

- Ev çi ye, tu dibêjî ez serxweş im. Min hemamê jî nîşanî te neda. Ew a kêleka wê oda hemberî te ye, va ez lamba rê jî vêdixim ku tu şaş nebî. Ji ber germiyê xew re neçî, ji ber ku tu gelek aciz bûyî.

Min gelek dirêj kir, bawîşk tên te. Ji bo çi tu xweşûştinê nahêlî sibê?

Camêr got:

- Ez qurbana te bim, dev ji min berde, ez ji xwe ji xweşûştinê bêzarim, ger ez xwe niha neşom heta du hefteyên din qet nayê bi bîra min, niha ji hemû deman baştir e, dema ku ez bi serê sibê rabim wek nû reh di min de bê ez ê wisa bim. Bi dengê gelek şad û hinek bilind bang lê kir. Giyana min, Lawe, sibeyî mesela Hêwa ji bîra te neçe.

Lawe jî bi matî ve gotê:

- Înşallah!

Dema Camêr deriyê hemamê vekir, ecêbmayî ma. Di temamî jiyana xwe de di hemamek wiha de xwe şûştin deyne ciyek, her çavên wî jî pê neketibû. Hemama spî ya biriqandî, wekî ku sehkiribû kesên xwedî waridat vê hawuza han tejî av û bîhnên xweş dikin û vêca xwe pê dişon. Qet tu carî ketibû bîrê ku xwe di hemamek wiha de bişo.

Destê xwe da sarî û germiya avê û perşên ava sar di ser û guhên wî de hatin xwarê, musluxa ava sar hinek girt û hêdî hêdî bi wasita musluxa din ava ji herdu musluxan dihat kir qayîde û xwe lê girt ku tejî be. Xwe tazî kir, piştî çavgerandinek li ser pêjgîrên rengareng ên daliqandî, şuşên bîhnên xweş û hemû cur sabûnên xweşûştinê, lingê xwe kir nav hemamê, piyê wî şemitîn û bi ser pişt ket navê. Hinek arhan Ji çok û enîşkê wî hatin. Pişt re wî xwe di nav ava germok de dirêj kir. Dema ew bi xwe hesiya, ji hindurê dilê xwe ve axînek kêşa û di dilê xwe de got: "Xwezî Hêwa û dayîka xwe jî li vir bûna, bêguman hemû eziyet û cefayê bendîxanê dê

34

bi maçîkek wan ji bîra min biçûya. Dê neyse gelek çûye û kê maye. Xwedê tu qezabelayê nede, du rojên din li vir in." Wî sabun û lêfikê girt destê xwe û ket xweşûştinê. Xweşûştina hemama ji motîfên rengareng hatî durustkirin û ava germok a ji duşê derdiket, dema ku li bedena wî diketin, xweşûştinek anî bîrê.

Deh sal berî niha dema ku girtin heta sê mehan îmkana xweşûştinê nedanê. Ew jî ketin gilî, gazind û grevan û heta dewlet mecbur ma ji panzdeh roj carek îmkana xweşûştinê bide wan. Ji bo ku Camêr dema xwenîşandanê de hatibû birîndar kirin, yek ji wan serokê tevgerê yê mezin hesabandibûn û di hucrek yek kesî de digirtin. Vêca ket bîrê

çawan rojek yek ji wan gardiyanan derî lê vekir û  
jê re got ku rabe ji bo xweşûştinê xwe berhevî bi  
ser hev bike. Ew jî ne kincek wî yê paqij û ne jî ji  
bilî pêjgîrek qirêjî gemar pê ve xwediye tişte bû.  
Dema ji hucra tarî derket der ve, heta demek dirêj  
çavên wî li ber tîrêjên rojê venebûn û ji ber vê,  
bi awakî korî bi pê dengê piyên gardiyanê pêşiya  
xwe ketibû. Gelek bi ser de neçû bi tundî deriyek  
vekir û li ber sekinî û heta ew gihîşte ba deriyê.  
Dema ew gihîşt ba derî, dehfek fê da, lê şansê wî  
hebû, di ciyê bikeve erdê li mirovek din hindur de  
sekinîbû ket û herdu bi hev re ketin ber dîwara  
çinko. Gardiyan ji wan re got: "Xwe tazî bikin". Pişt  
re hevaleyê wî Jî hat eynî tiştî got û mirovekî din jî  
avêtin hindur. Vêca 1i wan re gotin: Eva hindur ji  
we re, dê hûn hersê bi hev re xwe bişon. Heta  
pênc deqîqan divê hûn xwe bişûn, çunkî girtî gelek  
in û hemû bi ser hev sê hemam hene.  
Derî bi ser wan de girtin û ji wan re gotin ger  
heta pênc deqîqan hûn xwe neşûn em ê we rût derêxin  
derve, pişt re nebêlin hukumet zalim e û  
gardiyan kaflr. Webalê we li sitoyê we.  
Girtiyên din ku wisa diyar bû ji Camêr destsiviktir  
bûn, cilên xwe yên qirêj bi xwe re anîbûn ku  
bişûn, bi naçarî cilên xwe dan milek û hersê ketin  
hemamê. Hemam, ji çar dîwarên çinko pêkhatibû,  
35  
çîmento rijandibûn binî, bîdonek mezin a qîrê tejj



av kiribûn, bi milî din ve di binî de agir vêdiket. Tenekeke neftê jî tejî ava sar kiribûn, ji hersêkan re jî qutiyek penîrê ya vala danîbûn ku bi wê av bi ser xwe de bikin. Ji ber lezkirinê nedizanîn çî bikin. Yekî ji wan destê xwe kir nav ava bîdonê û bi şewat paş de kêşa. Qet tiştekek di hemamê de tune bû ku li ser rûnin. Çîmento jî ewqas germ bûbû nedikarîn xwe li ser ragirin û çawan xwe bişûn û çî bikin? Di dawiyê de wan ava sar a di teneka neftê de hinek rijandin ku ew jî şiletên bûbû. Du-sê qutî ava germ kirin li ser û ketin xweşûştinê. Hersê bi hev re di eynî wextî de destê xwe dibirin qutiyê ku av bi ser xwe de bikin. Pişt re kirin dor û heta kef bi ser û guhên wan de hat xwarê. Ava biniya tenekê ewqas germ bûbû ku Camêr nediwêriya bi serê xwe de bike. Ew di vî halî de bûn, hê destê xwe bi laşê xwe nedabûn ku bîhna xwîdan û qirêjayê însan gêj fikir, ji nişkave gardiyan bi qamçiya xwe ve ket hindur û kir qêrînî: "ev çî ye, we hê xwe neşûştiye? Dê yallah derên ji derve xwe zuwa bikin". Dema ku wî nêrî, yek ji wan (Camêr) hê ser guhên wî bi sabun e û dike bi destên xwe Ji xwe paqij bike. Nişka ve, wî dest avêt teneka ava germ û bi carek ser de kir, ji ber êşa şewata sermil û guhên xwe, qîjîniyek wisa ji Camêr çû, gardiyan dest bi qehqeha pêkenîne kir. Bi qamçî, şeqam û dehfdanê ve hersêyan kirin pêşiya xwe, xistin odek sar. Di hindur de dîtin ku sê bedbextên

din xwe tazî kirine û bi rûyek xweş û geş li benda xweşûştinê ne. Camêr bi sermil û guh şewitî, anîn ciyê wî. Piştî vê şewatê melheze dikir, eger ji vir şûn de dema ku dora wî ya hemamê bê, hersê yên ku bi hev re dikirin hindûr yekûdu bişon. Lê karbidestên zîndanê her zû bi vê yekê hesiyar û bîryar dan ku ji vir şûn de her car sê kesên nû bi hev re bînin xweşûştinê. Li gel vê jî, girtî guh nedan vê plana bendîxanê û her li ser riya xwe meşiyar, lê çî hebû yên wisa hebûn salê carek dora xweşûştinê nedihat wan.

36

Camêr di nav ava germok û di hemama kaş a mala Lawe de ew hemama xwe ya zîndanê bi bîr anî. Wî nefesek kêşa. Piştî xwe ziwakirinê, wî cilên xwe yên kevin li xwe kir û rabû çû ciyê xwe yê raketinê. Ewqas mest bû her tenê xwe kir nav ciyê xwe, êdî bê ku hay ji nerm û hişkiya nivînê xwe be, xew ket çavan.

Hîn dinê niv tarî û niv ronî, Camêr ji xew hişyar bû. Berî nehat bi birê, ew li ku raketiye, li derûdorê xwe nêrî û bala xwe da odê, vêca hat bîrê ku ew li ku ye.

Dema wî dît hîn zû ye, lehêf kêşa bi ser çavên xwe de. Va deh sal bû ku yekem car bû, ew di nav nivînek wiha nerm û xweşik de radiket. Gelek lê xweş dihat ku rakeve. Lê Ji nişka ve tiştê di mejiyê wî de vizînî kir û bi tundî lehêfî li ser çavên

xwe da alîkî. Va ye nêzîkî deh salan bû ku di vê seetê di nav ciyan de nebûbû, niha dema hejmartinê bû, pênc pênc wekî pez di hewşê de pêşiya fermandarê zîndanê de rêz dikirin, niha jî wek ku havriyên wî rêz kiribin û li ser piyan didan sekinandin. Hey çî kafirbav bûn. Carên wisa hebû seetek zêde wî xelkî bi wî awayî dihîştin, bê ku yek biwêre rewşa xwe biguhere. Wey li halê wî yê xwe şaş bike, destê xwe deyne erdê yan rûne. Gardiyan bi qamçî, şeqam diketin ser, bixwe li kuyî te diêşe.

Camêr di van cure melheze û fikirkirinan de bû, Lawe bi hêdîka ve deriyê odê vekir, dît ku camêr hişyar e, ket hindur û got:

- Roj baş kek Camêr, tu hîşyar bûyî? Em zû de ji xew hîşyar bûne, lê min nexwest te hîşyar bikim, min got aciz bûye bila rakeve. Dê ka fermo rabe em herin xwirîniya xwe bişkînin.

Camêr ket pê çûn oda nanxwarinê, li ber çayê re vê axaftina han kir:

- Ez jî demeke hîşyar bûbûm, lê ez şevê baş raketim, heta sibê min xwe tev neda.

Lawe got:

- Wisa be haya te ji teqîn û tuqîna îşev nebûye.

37

Dengê teqîniyê ewqas nêzîk bû, dûr nîn e hêzên "L.A.N" avêtibin ser bajêr. Vêca Xwedê dizane eskerên dewletê dê îro çî ji xelkê bikin. Bêguman

kuştî, birîndar ji herdu milan û ji bêterefan jî hene. Dema ku teqîn tê sekinandin eskerên dewletê wek gurên har dikevin nav bajêr. Carek li ba wê taxa ku teqîn dest pê kiribe wey halê wan, çî mirovê bi nav û deng tê de mabe ku heta niha nehatibe girtin an xwe nefiroştibe dewletê, hemûyan digrin û dest datînin ser wan û ji navçê dûr dixin. Ji xwe ku qewanên fişengan li ber deriyê kî bibînin. ew bi ser û mal, tê de diçe. Di meha borî de ku di taxa "S..." de lêgerîn çêbû, bêtalîh û bêşansî di mala Marifê Reşê xezûrê Afrasya yê xalê min de kevne tabancek qerebîna ya riziyê jengarî ya ji dewra Teqyanûs (Deqlanûs) de mayî, dîtin. Bi bêpirs û gotin Nizarê kurê wî ku tekanê malê bû, girtin û hukmê heft sal zîndan danê. Dema ku avuqatê wî ji mehkema orfî re dibêje, ev tabanca han a jengarî kêrî tiştêk nayê û qet zerarek jî pê çênabe, her tenê bi nav tabance ye. Serokê mehkemê jê re dibêje: Rast e, gotina te ye, ji xwe me 1î di ciyê îdamê de heft sal cezayê zîndanê dayê û dev jê berda. Ger em tabanca ji dar çêkirî ya lîstika zarokan jî li ba yekî bibînin, her em hukum didinê. Çunkî nîşana hez ji çek kirin û bikaranîna wê ye ku ev jî mezintirîn metirsiye li beramberê hebûna desthilata hukümetê. Ji wê rojê şûn de avukatê wî newêre biçe ji îdara orfî yan ji tu mehkemê pirsê wî bike. Ji wê rojê vir de bi bê serşûnî kes nizane bi ku ve birine. Malik li wan

wêran kirin û jin û zarokên wî ji birçiyarîna pena birin ber mala bavê xwe ku divê pariya devê xwe têkin devê wan. Dayîka Afrasiya jî çû mala pismamek xwe li gund. Min gelek jê hêvî kir ku ew bê mala me, nehat. Wê got, çavên min ba ranagire êdî di vî bajarî de bisekinim. Êdî tu bi xwe jî dizanî ka Afrasiya xwedî bîr û baweriyek çendîn kevneperest bû. Ne niha ku temenê wî ji çilan derbaz bûye, di dema xortîniya xwe de jî ku em hemû kêman 38

zêde têkelî tevgera welatparêzî ya wê demê bûbûn, wî henekan pê dikir. Belavok belavktrin, civîn û axaftina me ya li ser rewşa welat, tiştêk bêfeyde û zerar dihesiband. Wî siyaseta karê mirovên mezin hesêb dikir, yanî ew ên ku di îşxalkirina welatê me de delal û cambazên emperyalîzmê ne. Wê demê û niha Jî.li ba wî wisa ye, li dijî rabûna hêzên pirrçêk ên xwedî top û firokên emperyalîzmê, xwe bi xwe kuştin pê ve tiştêk nîn e.

Camêr gotina Lawe di vir de birî û got:

- Giyana min, tu carek dev ji van behsan ber de. gelek wextê me heye ku em van axaftinan ji hev re ikin. Rabe here di riya Xwedê de yekî şareza û baş peyda bike. bişîne pê wan.

Lawe bi nefeskêşanek ve gotê:

- Ez bawer nakim em bikarin îro tiştêkî bikin.

Camêr bi hêrs got:

- Çawan? Çawan em nikarin tiştêkî bikin? Te bi

xwe şevê soz neda min ku beyana sibê yekî bişînî?  
Giyana min. evqas terkexemî neke.

Lawe bi awakî hîşyar got:

- Rast e, min soz dabû te, lê min çî dizanî şev  
dê êrîş bê ser bajêr.

Camêr bi toreyî got:

- Heqê êrîşanîna li ser bajêr çî ye li ser karê  
me?

Lawe got:

- Giyana min tu bê sebeb xwe nexe tengiyê, ew  
şeva ku êrîş tînin ser bajêr, bi roj nahêlin teyr ji  
bajêr derkeve, ew li gor xwe bi pê êrîşkerên şevê  
digerin ku li ba wan wisa ye, ew teyr in û bajêr jî  
qefes e, riya derketinê tê de nîn e.

Camêr axîniyek kêşa, got:

- Dibû min bizanibûya ku ez xwediyê wî bextê  
nîn im ku bi berdana xwe dinê biguhere û bibe  
cennet. Ew bextê reş ê bêah û mita tûşî deh sal  
girtin û malwêraniyê kirim, niha jî li ser eniya  
min wek daxeke kolandî ye.

Lawe xwest dilxweşiyek bidê, bi tebessumek  
zorî got:

39

- Ev axaftinên han ên pûç û vala çî ne? Maneya  
çarenivîsê çî ye, eger benîadem bi bûyîna xwe re  
hemû bûyer û qezî li ser eniya wî hatibe  
nivîsandin, êdî maneya hewl û xebata ji bo  
têkoşinê çî ye û bi kêrê çî tên? Camêr gotê, hewl

û xebat ji bo têkoşînê her me digihînin wê derece,  
paye û ciyê ku di çara te de hatine nivîsandin. Binêre  
çendîn hezar, mîlyonan xelk tê dikoşin û  
hewl didin, lê çi heye, nan jî bi destê wan nakeve.  
Gelek jî hene çi hewl û xebatek bi wî awayî jî nakin,  
lê tu dibêjî pere bi ser wan de dirile. Çavê  
xwe bi ser xwendekarê hevalên me yê dibistanê  
de bigerîne û bizane ka çend ji wan gihîştine wê  
drecê ku mamostên me çi payên bilind bi  
zîrekiya wan didan? Li milî din, di yekem, duyem  
û sêyemê hemû salên xwendina me de. ewên tiral,  
gêj û mêj bûn ku ciyê henek û qeşmeriya hemû  
kesan bûn, bizane çi di meydana kesp û karê aza  
de û çi jî di meydana memuriyetê de, xwediyê çi  
cî û payekî xuyayî ne, wek ku di xewnên şevan de  
bi bîr û hişî wan bi xwe de jî nehatiye.

Lawe piştî demek kurt got:

- Ya rast be, ev cur gotin û axaftin nakevin mejiyê  
min. Li ba min, bextiyarî yan serkevtin, berê  
hemû tiştê ser meşîna hewildanek bi rêk û pêk û  
ber bi armancek ronî û zelal a di riya xwe ya taybetî  
de ye ku ew tişt ji aliyê xelkê û mirov bi xwe  
de hatibe qebulkirin.

Camêr nefesek sar kêşa, got:

- Li hember bext û şansê raya te çi dibe bila  
bibe, qasî misqalek li ser min tesîr nake, çunkî  
jiyana min bi xwe belga mezin û aşkera ya bêşansî  
û bedbextiyê ye.

- Ca dê em dev ji van behsan berdin. îro niyeta te çi ye, tu naçî ji derve û hinek xwe mijûl bikî û bizanî ka çi bi ser bajarê me de hatiye?. Lê li xwe agahdar be, baweriya xwe bi tu dost û nasên kevin neyne, ev xelkî han gelek xerab guheriye, baweriya bira bi bira nemaye.

Camêr bi awakî bêzarî, serê xwe hejand û got.

40

- Ne bavo, her taqeta axaftinê jî di min de nemaye, ez di derdê xwe de daketime. Eger heye yek-du asprîn, berî ez herim oda xwe, bide min, belkî ez qet neçim derve jî.

Lawe pakêta asprînê jê re anî û ew jî çû oda xwe û li ser ciyê xwe vezela. Bîhnek çavên wî ketin hev. Dema wî çavên xwe vekir, hê wextê nanê nîvro yê nebû, melheze kir ka gelo çi bike û çawan roja xwe bibe serî. Taqeta wî ya çûna derve tune bû, bi ku ve here û here ba kî? Bêguman beşê zêde havrê û nasên wî yan hatine girtin an xwe gîhandine "L.A.N" û yan jî hatine kuştin, an mirine yan jî ji tirsan ziravê wan dê biteqe dema ku çavê wan li wî bikeve. Mimkun e, eger riya xwe ya ji wî guheztinê jî nebînin, wek mirov di pê gogê de banz bide dê bi wî awayî jê baz bidin. Tev ev di milek de û di milek din de jî nebûna Hêwa û diya wî dabû serê dilê wî. Herwiha jiyana tiralî û kêmçalakî ya deh salên zîndanê jî demarên wî tevizandibû û ji bo tiştêkî pêwîst jî taqeta wî ya



çûn, hatinê nemabû. Wî kitêbek girt destê xwe ku Lawe ji bo xwendinê danîbû ber serî, xwe li ser ciyê xwe dirêj kir û ket xwendinê. Lê çend kir hiş û bîra wî alîkariya wî nekirin, maneya gotinên nivîsandinê nedikarî bîne ba hev. Her gotinek di dilê wî de xeyalek çêdikir. Bi naçarî kitêb danî û xwe avêt ser çeng û perên Sîmirê xeyal û ew jî ji birûskê leztir ber bi cenneta yadgar ve firiya.

41

Berî destpêkirina vê çîrokê bi danzdeh salan, piştî nîvroyek havînê, Camêr bi dilek xweş û berîkek tejî, vedigerîya mal. Melheza wî mirovî gundî yê qenc û baş dikir ku va çend meh in li pê digere ku deynê bavê wî yê li ser, bidê, bê wê ku tu senedek wî hebe yan agahê wî jî Ji meselê hebe. Çendî mirovên baş, qenc û ecêb hene. Çiqas rica jê dikir ku lê bibore û niha nîvê deynê wî jê bigre û nîvê din jî du sal xwe bi ser de bigre, bi du teqîdan, eger Xwedê muhlet bide yê mayî jî dê bidê. Camêr ber bi mal de ket rê ku vê mizgîniya han bide dayîka xwe. Lê dema ku dayîka wî derî jê re vekir siha jinek tişteke reş li xwe kirî xuya kir ku ji eywana wan derbaz bû.

Camêr bi hêdîka, ji dayîka xwe pirsî:

- Dixuyê, mêvanê me hene. Mala kî ne?

Dayîka wî bi dengê bilind got:

- Camêr giyan, ev tu yî hatî, ya Xwedê tu bi xêr bê, derbazî jorê be, va Pîrozxan Jî li gel Kalê ya

keça xwe li wir in, xêrhatinê li wan bide û li ba wan rûne, heta ez bêm.

Camêr jî bi dengê bilind -ku wek guhê mêvanê wan lê be.

- Baş e, dayê. Ka ez dest-piyên xwe bişom ez ê biçim xizmeta wan. Gotin di dev de ber bi dayîka xwe ve hat. ku li ber devê tenûrê xwarinçêkirê ve mijûl bû, ji hêdîka ve jê pirsî: dayê ev Pîrozxan û 42

Kalê kî ne?

Dayîka wî jî bi dengê nerim got:

- Çawan, tu wan nas nakî? Pîrozxan keça Feqî Qadirê xalê min e. Zû bike zû, destê xwe baş bişo, here ba wan û ez ê jî xwarinê deynim ser agirê û bêm. Wext dereng e, ez ditirsim zû nepije û ew birçî bibin.

Camêr ber bi destzuwakirinê re ket bîrê ku mizgîniyê neda dayîka xwe ku mirovekî her ji ber xwe ve deynê bavê wî jê re aniye û dayê. Bi lez berî xwe da ber tenurê, lê dayîka wî zû xuya kir û ber bi wî ve hat û gotê:

- Ev çi ye, hê tu neçûyî ba wan?

Gotê : axir...

- Ez axir û maxir nizanim, here giyana min.

- Gotinek min heye.

- Çiyê te heye carek hilde, here, ez dizanim tu şerm dikî, ez ê gelek bi zû bêm hawara te.

Camêr bi naçarî riya odê da ber xwe, bi şermokî

silavek kir û bi awakî fihêtkirî wek di bin lêv ve xêrhatinê jin û keçikê kir û li ba derî rûnişt.

Keçik ku li gel ketina Camêr li hindur, rabibû ser piyan, bi dengê aza bersîv dayê û hat xwarê wî rûne, lê dema ku dît cî nîn e, qasek sekinî û pişt re berê xwe da Camêr û got:

- Kak Camêr, kerem bike tu here jorê rûne û vê ciyê han bide min. Ma qey gelo em mêvan in, çawa dibe tu li vir rûnî?

Camêr bi gotinên "tişteke nabe û qeyî nake" ve çû li ser kursiyek milê din rûnişt. Wî destê xwe miz dida û çavên xwe kiribûn kawaş û martakên odê yên kevin. Pîrozxan jî dest bi axaftina bûyerên zaroktiya Camêr kir ku çawan daniye ser milên xwe û li ber himbêza xwe ew mezin kiriye, gelek caran bi xwe re biriye mala xwe û du-sê rojan li ba wan maye û dê û bavên wî jî qet nehatine bi bîrê. Pêjin ji Camêr nedihat. Car caran di bin çavên xwe re, wî li keçika kêleka xwe rûniştibû dinêriya, ku gorên di piyan û delingên fîstanê wê dihatin xuyakirin. Pişt re dayîka wî ket hindur û wî bi awakî

43

serfiraz ji wî halî rizgar kir. Ew ji ber ve rabû. Dayîka Kalê jî li ser pahniya xwe ji ber ve rabû û bi gotinên nabe nabe ve milê Kalê girt û bir li ba dayîka wê Pîrozxan da rûniştandin. Taze ji nû ve ketin bi xêrhatin û pirsê kêf û ehwalan. Gelek bi zû qirika dayîka Camêr teji bû dest bi girînê kir û

got:

- Ez kor bim dayê, xwezî ez evdal û sêwî bûma  
bi vî awayî çavên min bi te neketibûya.

Jinik û keçik jî bi hev re ketin pite pitê, keçik  
gelek ji dayîka xwe dilkul û diltêr bû ku Camêr bi  
van girînan bêzar kiribû. Her çendîn Camêr tu  
tiştê Ji asteng û derdên wan nedizanî, lê di bin  
re ketibû gotina, riza rizayê Xwedê ye, çi tiştî ew  
neke nabe. Hemû bi hev re bêdeng bûn. Ji  
bîhndana jinikê ya giran û nefesên sivik ên dayîk û  
keça wê pê ve, tu deng di odê de tune bû. Dayîka  
wî hîs kir ku Camêr bêtaqet e, gotê:

- Dê tu jî rabe Camêrî giyan, here xwe biguhere  
û bîhnek vede, ji beyana sibê heta niha tu li ser  
piyan î, bêhal, bêtaqet î.

Eger bê cî nebûya, Camêr dikir qehqehê bavêtiya,  
jê re got:

- Dayê 11 ser piyanmayîna çî? Tu ji bo çî kula  
min dikêşî. Ji serê sibê de ez ewqas rûniştîme,  
laşê min hemû tevizî ne.

Cardin mesela peran hat bîrê, lê dem ne musaît  
bû, rabû û çû odê, cilên xwe biguhere.

Dayîka wî jê re xwarin bir odê û bi xwe jî li gel  
mêvanên xwe xwarin xwar. "Ev belayê nedîtî çî bû,  
ji bo çî vê dema han de hatin. Ji bo çî hatine, çî  
derdek wan heye yan çî li wan qewimî ye, gelo kesek  
wan miriye, ji bo çî hatine mala me? Min navên  
wan ji dayîka xwe jî nebihîstiye. Xwedê bike

xêr be. Carek piçek zehmet e xêr be, çunkî qet tişteq nebe mesrefa malê dê bibe du qat. Mirov ber bi çayê re nan û goz tenê nade wan. Dê cardin baş bû piştî serê rriehê hatin. Ger di nîvê mehê de bihatana halê me xerab bû. Ji nişka ve, ket bîrê ku perek zêde pê re ye. Lê wekî gelek tişteq xirab

44

ketibe bîrê, xwe gorz kir û bi dengê hinek bilind ve got: Na xêr, ev perê tişteq din e, ez destê xwe nadim quruşek wî. Piştî nanxwarinê bi hêviya dayîka wî bê jor û behsa peran jê re bike û pirsî mêvanan jê bike, xwe li ser ciyê xwe dirêj kir, lê dayîka wî nehat û ew jî, xew ket çavan. Qasek şûnde, ew bi xwe hesiya, rabû, ser û çavên xwe şûşt û berê xwe da, çû çayxanê. "Wisa dixuyê heta şev bi ser de neyê dayîka min bi dest nakeve". Di rê de, wî melheza zewacê dikir. Bi rastî, va demek dirêj e, herdu mil jî bêdeng in, vaye salek û du meh bi ser re derbaz dibe ku dayîka wî çûbû ba bavê Askol. Şeş-heft roj şûn de bavê Askol jê re gotibû, carek bi ser xêrê be Camêr nû ketiye kar, mehaniya wî kême û taze mal e û keça wî jî hê zarok e û dixwîne. Da em qasek din jî meselê bihêlin, belkî helek ji niha baştir bi destê me keve. Ji wir şûn de, wan qet vê meselê venekiribûn. Ji wê rojê şûn de, dayîka wî serê xwe nekiribû mala mamê wî, çunkî ev bersîva bavê Askolê raste rast mana nedanê bû. Baş e, tu dibêjî niha çi dibêje?

Dayîka xwe bişîne ba mamê xwe, tu çi dibêjî? Ez bawer nakim, ji ber ku dilê wê jê êşiya ye. Her ji destpêkî de daniyên wê li gel ên mala bavê Camêr di dîzmencelek de nedikelîn. Ew yekem bûka malê bûye ku daxwaza malcudabûnê ji mêrê xwe kiriye û êdî wekî nasek bi ser wan de çûye û hatiye. Di ciyê wan de berê xwe daye mala xizmên xwe. Ji derveyê vê, ger çendîn vê yeka han bi awakî aşkera li ber dilê wî nexistibe jî, lê her ji destpêkî de lê xweş nebû ku ji kurê xwe yê yekane re vê keça han bîne. Niha ev ên han tev derbaz bûn, ew bahanên dihatin girtin tev ji holê rabûn, eger bahanek negre, qote malek bi ser hev de aniye. Ev perên han jî têr û tejiya mesrefa zewacê dike û hê zêde ne jî. Bahana xwendin temamkirinê jî nema ye. Çunkî du sal bi ser hev di eynî sinifê de ma û dibistanê bi cî hişt. Çi dibe bila bibe dê ew îşev li gel dayîka xwe biaxive û ji bo hella vê meselê bişîne ba mamê xwe.

45

Li çayxanê li gel du-sê hevalên xwe, wan sohbet dikirin, di navek re pê hesiya ku seet ji nehan derbaz bûye, wî sohbeta xwe ya bi hevalên xwe re birî û got:

- Karekî min heye, divê ez hinek zûtir biçim mal, li min biborin. Di xweşiyê de bimînin. Carek din em ê behsa vê meselê bikin.

Bi lez wî riya malê girt, dizanî, piştî mêjê,

dayîka wî radikeve. Lê dilê wî bi mêvanan xweş bû ku belkî ji ber wan heta niha mabe. Ji derveyê vê jî, hetta li gel hesaba nimêjê û zû raketinê jî hê dereng nebû. Lê bi ser vê de jî di ciyê mifta di berîka xwe de bikar bîne, li derî xist, ji bo ku ger raketî Jî bin ew hîşyar bibin. Lê wisa dixuya ku dayîka wî û mêvan nû dikirin biçin ser ciyên xwe. Dema dayîka wî derî jê re vekir, wê bi dengekî bilind jê re got:

- Ji bo çi bi vî awayî dereng hatî, giyana dayîka xwe?

- Min çend hevalên xwe dîtî, em bi hev re runîştibûn, me sohbet dikir. Qet dereng jî nîn e, hê êvar e, we xwe bi xwe kiriye şev. Bêguman te Pîrozxan û ya din jî gelek bi zû biriye ser ciyê wan. Pîrozxan ku bi ketina wî li hindur, rabibû û li ser ciyê xwe rûniştibû, gotê:

- Ne bi serê te, aciziya rê li ser me bû û ji ber wê, me got her em zû rakevin. Ji xwe Kalê, dayîka wê bimire, ewqas aciz bûbû her xwarin di dev de radiket.

Camêr ji bo kinc guhertinê berê xwe da odê, dît ku ciyê wî di hindur de ye, li dayîka xwe nêrî û dayîka wî di pê de jê re got:

- Camêrî giyan, min Ji ber Pîrozxan û wan ji bo ku şerm nekin, ciyê te her di odê de hîşt. Pencera xwe veke, qet germ nîn e. Tu dikarî ji xwe re heta dereng rakevî, ne dengê min û ne jî germaya rojê

te hîşyar bikin.

Wisa jê re got û wê dikir biçe derve, Camêr,  
şidayî milê wê girt û gotê:

- Dereng raketina çî, divê ez seet heştan li

46

dayîrê bim.

Dayîka wî, ji ber xwe ve got:

- Dê bi serê te min wisa dizanî sibê î n e.

- Carek tu neçe, were ji min re bêje. Hezar û  
yek pirsên min hene. Yekemîn, Pîrozxan û ew ji  
bo çî hatine? Duyem, astenga wan çî ye? sêyem..?

Tu carek raweste yek bi yek, serî li min gêj  
neke. Pîroz, ji serê te dûr be, camêrî mêrê wê hatiye  
kûştin. Va ye mehek e mirovek xwedî nifuz bi  
ser de girtiye û dibêjin bi wasita wî hatiye kuştin.  
Çunkî çend caran daxwaz Jê kiriye ku kanîavek wî  
heye, bifroşe wî, mêrê Pîrozê jî bi vê razî nebûye.  
Rojek ew bangî derve dikin, dikujin û baz didin..

- Kesekî dîtiye?

- Dema kuştinê, nee, lê dibêjin piştî kuştinê, du  
mêr û sê jinan dîtine, heta niha tenê jinek ewêriye  
şahidiyê bike. Dibêjin, mêrik zordarek kafir e,  
gelek cotkarên belengaz bi vî awayî kuştiye û bi  
lula tivingê bûye xwedî gund. Ne tenê gund, Xwedê  
li mln negire, ez gotina wan dibêjim, dibêjin di  
gund de kesek xwediyê namusa xwe jî nîn e. Vêca  
niha Pîrozxan wekî bihîstiyê ku wî mirovê zorker  
awukatekî mezin girtiye û perek gelek zêde jî ji



bo bertîldanê tewsîs kiriye ku xwe pê rizgar bike,  
ew jî hatine li vir awukatekî bigrin û hewil bidin,  
belkî xwîna wan belaş neçe.

- Ez bawer nakim ew bi ser kevin. Ne tenê  
xwîn, dê perên wan jî belaş biçe. Ev dezge û taxima  
han ji bo wê danenîne ku zordaran di hindur  
de bigrin û mafê feqîran jê bistînin.

- Her çawan dibe bila bibe, kurê min, ew divê  
hewil bidin. Ma xwe nakin ber lehiya avê. Ez kor  
bim, kurekî wan jî tune, eger kurekî wan hebûya,  
her dê bikariya rojek tolê jê bistîne. Lê em ê çi  
bêjin, ji derveyê dilê me bişewite pê ve, tişteki ji  
destê me nayê. Ji xwe re çawan baş dizanin, bila  
ew wisa bikin, her sed sal jî li vir bin, ez xwe li  
hemberê wan xwedî mal nizanim. Tu nizanî çend  
qenciya bavê wan li ser me heye.

- Baş e. Tu bi kêfa xwe yî. Ev yek di bîra min de  
47

nebû ku ez ji te re bêjim, ya rastî wext tune bû, ez  
ji te re bêjim. Îro mirovekî hat ba min û got "min  
ew deynê bavê te yên li ser min ji te re aniye, ez ê  
niha dused dînar bidim te û yên din Jî ez ê bi du  
teqsîdan bidim." Ya rast be, beşa hemû mesrefên  
zewacê dike, eger ew bahanek li me negrin.

Dayîka wî jî îstîniyek kir û ji hêdîka ve gotê:

- Xwe şaş nekî, heta ev mala han li vir bin behs  
bikî. Nexo heyayê me ya hezar salan dê pê biçe.  
Piştî van jî hewce ye, du-sê meh bi ser re derbaz

bibin, wê çaxê em pê de biçin qeyî nake, eger çi...  
Qet..

-Eger çi çi ye? Biaxive, ez bizanim niyeta te çi  
ye?

- Ez dibêjim, eger ew Fatiya qelew a ku ez dinasim  
be, keç ji te re nade.

- Çawan nade min?

- Qet kurê min... Xwedê bike bi kirasê berê wê  
ve bide te "kor çi dixwaze? du çavên ronî". Neyse  
her çawan be, carek ka heta ev mala han a ji nev  
şeqitî li vir bin, bila derxûma dîzikê li ser devan  
be.

- Baş e, gotina te ye, niha wextê wê nîn e. Xwedê  
bike rojêke zûtir karê wan biqede û biçin.

Dayîka wî lê xist û çû derve û ew jî li ser ciyê  
xwe vezeliya û ket melhezan.

Du-sê hefte bi ser hatina mala Pîrozxanê re der-,  
baz bûn, rûyê wan û yên mêvanên wan li hev hilo  
bûn û êdî wekî yekek ji malê diçûn û dihatin. Camêr  
jî wan hemû şermokî û awayên bi fihêt ketina  
li mal ji ser xwe avêt, ne tenê ev, ber bi derbazbûna  
rojan, komên mij û muranê yên li der û  
dorên Camêr û serincên şermokiyê, bi dizî ve wêneyek  
li ser hişî wî neqışandibû, bi taybetî ya  
Kalê. Keçeka xwînşêrîn, şanzdeh-hefdêh salî ya  
delal. Pirçek reşa dirêj a hemû dem şehnekirî,  
heta li ser kamaxên wê hatî, du rêz bijangên şaş  
ên dirêj ku car û caran dema serî hildidan

baweşîna ronahî, xweşî, ciwanî û sipehiyê jê dihatin der. Pozek hinek pan bi ser dev û lêvek girovel

48

a şerabî de û xwedî rûyek bi çav û bedena wê lêhatî. Bi kurtî Kalê keçek rehsivik bû. Jixwe, ew kiras û êleka reş a di van dawiyên de bi zorî li xwe kiribû, wê kiribû perî, ji derveyî vê wêna xweşik û ciwan pê ve, heta wê demê qet hîsek wiha di dilê hezîn ê Camêr de rûneniştibû.

Pîrozxan û Kalê, bi germî, li çaveriya roja mehkemê dikirin, roj nebû du-sê car tarîxa roj û mehê ji Camêr nepirsin. Di dawiyê de, piştî çaveriyek nexweş, roja mehkemê hat. Ew roj di serê beyana sibê de Pîrozxan -ku di dawê de şahidiya wê hebûçûbû mehkemê. Dema Camêr ji dayîrê vegeriya, zanî ku dawa wan, ji ber nehatina çend şahidan, avêtine deh roj bi şûn de. Hemû bile-bila Pîrozxan ji ber wê bû ku heta deh rojên din ew nikarin vegerin. Dayîka Camêr û Camêr bi xwe jî jê gilî û gazind dikirin ku 1i bo çî ew mala wan wek a xwe hesêb nakin û fikra çûnê dikan.. Her çawan bû, bi naçarî ew man û wê deh rojê jî birin serî. Cardin roja mehkemê, yek ji şahidan, bi taybetî ew jinika ku şahidiyê dabû, nehatibû mehkemê, dawa wan 23 rojên din bi paş de avêtibûn.

Dema ku şevê behsa vegeerê hat kirin, Pîrozxan ji Camêr re got ku beyana sibê di otomobîlek de ciyek jê fe veqetîne.

Camêr bi vê yekê ecêbmayî ma. Lê Kalê vê ecêbmayînê ewqas dirêj nekir û hilda, got:

- Bi Xwedê dayê, te min jî li gel xwe biriya, gelek baş dibû. qet tişteki tê de nîn e. tu dibêji ew ê ewqas namerd bin, dest ji bo jinikan jî dirêj bikin?

- Belê keça min, tu wan nas nakî, ew hê ji vê jî namerdtir in, ku wan dest ji bo pîremêrek Quranxwîn, bê ah û mita yê wekî bavê te dirêj kirin û kuştin. Di pişt xwe de, ez agahdar im, ez baş dizanim ku ew çawan li te dinêrin. Hê par ne, pêrar bû ku Kerîm Beg xwazgîniyên xwe ji bo te şandin, ji kurê xwe Ferîdun re. Tu dizanî -dûrî serê texwestin bi xizmatî dest deynin ser ocaxkoriya me, lê bavê te -gora wî tijî nûr be- pê xwe da erdê û

49

got, "min nedaye û ez nadim, ez keç nadim zorkeran."

Her çendî jê re gotin, ne ji bo wî ye ji kurê wî re ye, lê bavê te got yê xwedî mişk be, cewal ji dest diçe. Tu dizanî, heta nîria min qet behsa vê yekê li ba te nekiribû. Lê ji bo ku tu bizanî û şaş têngihî, ez vê yekê dibêjim, ez vegera xwe tenê baştir dizanim. E giyana min, ez di niha de bîriya te dikim, va şanzdeh sal e, şevê xew neçûne çavên min, berî ku guhên min hîlma devê te seh nekiribe û çavên min bi çavên te neketibe û destê min neketibe ber milên te.

Dayîka Camêr bi awakî gilî û gazind got:

- Ev çi ye, Kalê xanim, yanî tu bi me razî nîn î?

Ferqa li vir û li wir çî ye? Vir jî her mala we ye. Bi serê Camêr, qasî ez ji te hez dikim, ez ji keçên xwe hez nakim.

Kalê ji şerman sor bû û bi dengekî hinek bilind got:

- Ne bi Xwedê xaltiya Ecê, ji ber vê nîn e, ya Xwedê mala we her ava be û hezar mal li ser zêde bin. Em li mala xwe bi xwe jî evqas dilxweş nebûn. Lê tenê, ev heye ku li min xweş nayê, dayîka min tenê vegere.

Dayîka wê gotê:

- Tu guhê xwe nede min. Çî dikarin bi min bikin? Ji bilî vê, em ji yekûdu cihê jî bin, ez wan zevî, zaran ji bo wan di cî de nahêlim. Heta xwîn di demarên min de bigerin, ez ê wekî sitirî biçim nav çavên wan. Da bila carek ev mehkeme û tiştên han biqedin, ez ê zordarekî wekî wî bînim gund û nîvê zevîyan belaş bidimê, wê çaxê bila ew ji xwe re şerê san bikin. Ez nizamim, bi Xwedê. ez di vê de jî dudil im, ez ditirsim, cardin cotkarên feqîr tê de biçin. Çî dibe bila bibe, tu xwe têkelî min neke. Dev ji min berde ka niha ez tenê vegerim, vaye Xwedê li vir daye, mala wan ava be, Ecê Xan wekî dayîka te ye û ji xwe kak Camêr jî birayê te tê hesêb. Dema ew bibînin, min te bi xwe re nebiriye, dê tê bigihin ku em ji kona darê nehatine derê.

50

Şevê, Camêr li ser ciyê xwe melheza wan gotinên  
mana Kalê dikir. Wekî tiştî serê wî gêj bibe,  
wî nedizanî ka mana wê başe yan ne baş e. Lê li  
gel vê jî ew hinekî bi heyecan bû, ev yek jî zêdetir  
ji ber wê bû ku bi navê jinan di mal de xwîşkek wî  
jî tu bêjî tune bûye, ji bilî dayîka xwe tu jinê jî  
nedîtiye û hetta li gel Askolê destgirtiya xwe jî ji  
danzdeh saliya wan pê ve kesek wan bi serê xwe  
bi hev re nedîtiye. Ne tenê ev, heta ew baş nizane,  
keçek çawan e ku di navbera van pênc-şeş salên  
dawiye de yekûdu di nêzîk ve nedîtine, çi bi ser  
de hatiye çi ji gundan be û çi jî Ji derveyê gundan  
Ji ber vê, wî bi xwe ji xwe re digot; qet dûr nîn e,  
ev şepirzetiya han ji ber vê be ku yekem car e, di  
jiyana xwe de, li gel keçeke ciwan a wek xwe bi  
şev û bi roj di malek de bi hev re dibin.

Pîrozxan çû û Kalê li wir ma. Mayîna Kalê, derbazbûna  
rojên hêmin, bûyerên xweş û pak, gelek  
alîkariyek zêde ji bo holêrakirina wan şerman kirin  
ku di destpêkê de wek pîrhevok suwarê ser  
singa Camêr bûbûn û wî kiribûn nav tengiyê û wek  
mirovekî rêzê di mala xwe de hereket bike. Ne ev  
tenê, hêdî hêdî ew li gel hev bûn havrê jî. Camêr  
ku bi hatina wan re, mal lê bûbû bendîxane û eger  
ji bo nanxwarinê nebûya nedihat malê, vê carê  
eksê vê, çûna ji der ve li berçavan ket û bi naçarî  
nebûya ji mal dernediket. Bi hêsanî, wî Kalê hînê  
lîstina damê kir. Ew rûdiniştin, seetek û du seet

bi hev re dilîstin. Car û baran Camêr sist digirt ku jê bibe. Pişt re daxwaza kitêbên Kurdî jê kirin ku ji xwe re bixwîne, çunkî ji kurdiyê pê ve, wê qet zimanekî din nedizanî. Lê Camêr çendîn hewil dida ji bilî kitêbên şîirê pê ve tişteke tune bû bidê, ew jî piranî behsa evîniyê dikirin. Ji ber vê, wî di destpêkê de avêt pişt guhê xwe. Lê ku wî dît ji destê wê rizgar nabe, bi naçarî dîwana Nalî, Salim û Mehwî jê re anî. Nexweştirîn dem li ba Camêr ew bû ku Kalê dihat li balê, gelek bi pakî û bêniyazek, mana şîireka evîniyê jê dipirsî, ji bo ji ber gotinên erebî yan farisî yan ji ber giranî û aloziya

51

wan tê nedigihîşt. Di demên wiha de şermê temamê giraniya xwe berdida ser Camêr û zimanê wî dihat girêdan, ew sor dibû û bi awakî wisa ku gelek caran gunhê Kalê pê dihat û kitêbê ji destan distend û digotê "qeyî nake kak Camêr, ez bi xwe dê tê bigihîm, ka carek din ez bi xwe bixwînim, eger ez tê negihîştim, vêca ez ê bêm ba te". Hinek caran jî wek rikê wê ji şerma Camêr rabe, wê jî milê rikoyiyê digirt û Camêr çendîn mor û şîn bûya, heta mana wê bi wî nedabûya gotin jê nediqeriya. Vê yeka han wisa li Camêr kiribû, ku bikcve bîrê, Kalê bi derewî xwe li nezanîne dide û dike bahana axaftinê. Ger çendîn ev nêrina han bêbingeh nebû, lê ev bûyerên han fikir û melhezên Camêr kirin nav gêjbûnek nû û yekem car encam û

metirsiya jiyana kur û keçek pêk ve anî ber çavan.  
Ji ber vê, wî demek xwe dûr xist, rçjek nehat  
malê ji bo nanxwarinê û şevê dereng hat, lê ji  
der ve jî her bêaram û aciz bû. Dayîka wî û Kalê bi  
xwe jî serî danîn ser û naçar kirin ku dev ji  
mayîna derve berde. Bi vî awayî, hingî diçû xem û  
xeyalên Camêr zêdetir dibûn, ku didît, dîkin ew  
hevalbendiya paqij û sade ya li gel Kalê wek berî  
nemîne.

Piştî deh-danzdeh roj çûyîna Pîrozxan, ket bîrê,  
dê baş bibe ku dayîka xwe bişîne mala mamê xwe.  
Her qet nebe ji bo teqilandina devê jina mamê  
xwe. Eger vê carê jî tiştêkî bêje, bi taybetî ev dê  
vê dema han de gavek baş e. Ji bo çî, bi taybetî di  
vê demê de? Camêr qasek ji gotinên xwe hîşyar  
bû, lê nediwêriya bersîva "ji bo çî" ya xwe bide.  
Madem wiha ye, bila dayîka wî biçê û bizane jinmama  
wî çî dibêje. Ew keça xwe didinê yan na.

Tirs û lerza wî ji bo çî ye? Ji derveyê vê, çî peywendiya  
wan bi kuştina bavê Kalê ve heye, dehpanzdeh  
roj şûn de dê vegerin ciyên xwe û pişt  
re, wekî kevirên biniya goman, dê li wan bê, bê  
wê ew hetta bi man û nemana xwe jî bizanin, bila  
dayîka wî biçê. Da zûtir biçê dereng e, va ye deh  
dînar zêdetir ji peran xerc kiriye. Bi vî awayî biçê  
52

dê filisa wê ya dawiyê jî xerc bike. Eger dayîka wî  
neçe dê ji Lawe re bêje. Bi rastî dê bibe xwedî xesoyek



zorzan û canbaz, tu car ji mekrên wê dernakeve.  
Xwedê bike Askol jî li wê neçûbe, hegene dê  
herdu bi hev re wî bikin îbret ji bo mêran. Kenek  
ew girt.

Dema wî ji dayîka xwe re got, wê xwest bahanek  
bigre, lê Camêr bahana wê di dev de birî û  
got:

- Qey çi dike bila Kalê li mal be, eger tu dixwazî  
wê jî bi xwe re bibe.

Dayîka wî piştî demek, zîq lê nêrî û biryar da  
ku Kalê jî bi xwe re bibe. Lê keçikê hez çûnê nedikir.  
Bi awakî zorî ji dayîka Camêr re got ku ew hê  
di şînê de ye, baş nîn e, bikeve geranê, bi taybetî  
ji bo malek ku wan nasnake, lê feyde nekir, got:

- Berî nanxwarinê, em ê gavek bi ser piyan, serek  
li wan bidin, ma em ji bo birinc xwarinê  
naçin. Bi serê te ger ji bo xatirê Camêr nebûya,  
min serê xwe nedikir mala wan.

Dema ew hatin mala Fatmexan, Kalê gelek  
şermezar û dayîka wî jî pirr poşman bû. Qet ji  
dilê wê dervediket ku ji bo çi bi zorî vê keça han  
a bêbav bi xwe re bir û tûşî şermezarî û nexweşiyê  
kir. Ji bo wê qeyî nedikir, ev karê han, her karê  
wê bû û dibû biçê. Dibû bizane. Lê tuff. Camêr jî  
Xwedê ji qeda û belayê biparêze, dem û wext jê re  
nîn e. Eger niha dema xwazgînî û jinanîna me ye?  
Qet nebûya ji ber dilê vê keça han a bavkuştî, dibû  
meselê bavêta wexteke din. Qet nebûya, piştî ew

biçûna. Lê mirov dê ji însanek cahîl re çî bêje, ji xwe navê cahîltiyê bi xwe li ser e. Jinek wek wê Fatiya qelew bêdev û şîpane nehatiye dîtin, wî derdê di dilê xwe de nehîşt û gotê: "Ev bû delala ber dilê we" Serê xwe li keçikê bada û wek tenekek av ji devan biherike, çavên xwe girt û devê xwe vekir. Dema wê bi vî awayî diaxivt te digot

53  
ser, çav û piyên min ji nav avê dendstine. Piştî van gotinên wê, wek ku ez gêj bibim, min nekarî ez tiştê bikim, êdî ew jina çavqelişî û lêvmartak firsetê neda me û ket ser. Tu bi Xwedê, ummetek wiha bêşerm û heya heye? Qet firsetê neda min, ez bixivim, wê bi meselê bigihînim. Bi nebxêrê min birek gotin hazir kiribûn. Lê gotinên çî, wek tu tiştê di bîra min de nemabe û min tev ji bîr kirin. Xwedê xêrê bide Kalê, wê got, xaltî rabe, em biçin. Eger ez wisa gêj bibûm, rûniştin ji di bîra min de nemabû. Çî dibe bila bibe. Ji bo min qeyî nake, ne xem e, lê zêdetir heyfa min bi wê keça bêbav hat, gelek şermezar bû. Di serî de ew ji çûna xwe razî nebû. Destê min bişkê, min ew mecbur kir. Mirov dê çî bike, tu dibî wiha dibe, tu nebî jî nabe. Ji xwe ez qurbana wî bim, Camêr wekî pîr û kalan wisa ye, qet bi kurên vî zemanî naçe. Lê nexêr nexêr, ma qey her ciwan nîn e, gelo niha dê xelk ji me re çî bêje? Kur û keçek ciwan di malek de û derî bi ser de girtî, bi teniya serê xwe hiştiye.

Kes ji me re baş nabêje. Ez ê niha bi xwe li mal bim. ez ê dê bîhnek mal xalî nehêlim. Ez nizanim çi ye, Xwedê gunehên wî ji min nepirse, Camêr jî guheriye, gelek ji berî zêdetir di mal de dimîne. Ji derveyê vê jî, ew zêde li gel Kalê rûdine, ger carek jî bibe min ji bilî dame lîstinê pê ve ken û yariyeîc wan jî bi hev re nedîtiye. Li gel vê jî, ew gelek bi hev re dimînin. Gelo tu dibêjî... Çi tê de heye? Xwezî. Xwezî wan hez ji hevûdu bikirana û wî wê bianiya. Ferek sola wê ya diriyayî bi keça Fatêya hirçê kevin tîne! Ew niha jî xelkê xulamê bavê xwe dizane, dizane ku dewr dewra berê ye. Xwedê li me giran negre û bê lome be. niha jî wisa hêzir dike ku divê herkes destê wê maçî bike. Ew bêhişî bû wê bi me re kir, ger ji bo riyakarî jî bûya, ji me re negot, neçin li vir xwarinê bixwin. Te digot, dê mewludê bide û ez ê mehra wan li ser bibrim. Kur kurê min û keç keça min. Baş e, qeyî nake, bila wiha be. Vêca ger ez jî jin bim, ez dizanim ez ê çi bikim. Xwedê ya xwe baştir dizane. Bê-

54

guman rizayê Wî li ser e ku ev karê han pêk bê, eger jinikê nedikir hala hala û Kalê nîşanê me nedikir. Wekî melayê Mezbûrê ku xurmê nîşanî baqal bike, çavên me bi xwe li hember kor bûbû. Ez nizanim Camêr ji ku yê Askol hez dike? Tu dibêjî wek çiqek darê ye, wisan hişk. Dev û çavek dirêj a pençekêş wekî dara wawîlan ber bi asman

ve çûye. Xwedê li min negre, ew keç ji hindurê xwe de sax nîn e. Dûr nîn e, derdekî wê yê xerab jî hebe. Na dayîka min, bi Xwedê ez kurê xwe bi korîtî naxim vê davika han, min wî bi dil û can û bêbavîtî mezin kiriye. Baş e, ez ê çawan kelkela Askolxan ji serê Camêr derînim? Ev jî ne tişteke e. Xwedê yar be û ciwaniya Kalê xweş be, ev jî rehet e, bi piştevaniya kerîtî û pozbilindiya Fatmexana jinmama wî. Ev cur bîr û gotin di mejiyê Ecê de dihatin û diçûn.

Piştî nîvro, dema Camêr hat, gelek hewil da ku dayîka xwe bi tenê bibîne da bizane encama çûna wan çi lêhat, ji bo ku dayîka wî jî hez dikir, her zû Kalê bi seleteçêkirinê ve mijûl kir û bi hev re çûn oda Camêr, Ecê dest pê kir û got:

- Bi Xwedê kurê min, tu beleheq û belesebeb me sivik û ruswa dikî. Hegene tu dizanî, Fatexan keç nade me.

Camêr bi mat û melûlî, jê re got:

- Çi bûye dayê can, Xwedê neke tişteki qewimiye?

- Çi biqewime kurê min. Tenê ew ji me kêm mabû ku hinekî li me jî bixe.

- Kî? Çawan? Bi heddê bavê wan e. Bêje da ez bizanim çi bûye, te ez teqandim.

- Dijminên te biteqin kurê min, bi kurdiya wê, "em keç nadin rûtan". Ewqas!

- Baş e çi bûye? Çawan? Ew çi dibêjin?

- Çi bêjin. Dema em çûn, Askol ne li wir bû. Devê

min şewitî, dema min pirsî. Wekî min jê re xeberan gotibe, Fatexan li min rabû û got Askol çi re ye, Askol li vir nîn e, Askol çûye mala xaltiya xwe. Va qaseke ku tu bi xwe jî dizanî dê Askol bi kurê xaltiya xwe re bizewice. Yanî kurê xwîşka dayîka 55

xwe. Min jî qet neaxift. Min gotê "Fatmexan, rehê min, jixwe, min ji ber tu armancê pirsî wê nekir, tenê min xwest, ez bizanim ka li ku ye". Camêr, êdî wê nehîşt, ez gotina xwe biqedînim û got: ez Camêr û mamêr nas nakim, ji vir şûn de, ez bi tu awayî qebl nakim, navê keça min bîne. Eger em keç bidin Camêr begê heta pirça spî mala xwe de vehûne, wê çaxê dê bikare perê cotek guhar bide hev.

Camêr nefesek kêşa û serê xwe hejand û got:

- Belê çima? Ji ber çi, bi vî awayî bi tundî. Ji ber çi, bi vî awayî nexweşî. Ew keça xwe nadin, bila nedin. Mala..., lenet Şeytanê bê û wî tif kir û berî xwe zivirand!

- Giyana min, ew li bahanan digerin. Nexo eger ew şer nekin dê çi ji dost û dijmin re bêjin. Ew ê çi bêjin ku ji Camêr poşman bûne keça xwe nedanê û dane Şêx Hesên.

- Neyse, çi dibe bila bibe, êdî tu bi vî meselê neaxife, ez ê bi xwe biçim û bingehê wê bizanim, ez ê ji wan re bêjim: eger hûn keç didin min bidin û ser xêrê û di nav şahiyê de be û hê min peran

xerc nekirine bidim we û bibim, hûn nadin jî, ji min re bêjin, bi bê nexweşî û dilêşî, bila heryek ji me hesaba xwe bizane.

Ecê wekî tu neft bi ser de bikî, agir pê ket û got:

- Çawan tu bi gotina min bawer nakî. Ez derew dikim? Ez li wan îftîran dikim? Bi vî awayî got û dest bi girînê kir.

- Dayê can, ez çawan bi gotina te bawer nakim, min çî gotiye, ma qey nabe ez bi xwe jî du gotinan bi wan re bikim. Li gel Lawe, li gel jinmama xwe. Baş e bavê min, em ê xwe bêdeng bikin û heta bizanin ka ew çî dibêjin. Baş e, şert be, ez tu gotin tê de nekim, wekî qet tişteki neqewimî be. Baş e! Wî destê xwe kir ber milê dayîka xwe ku digiriya û gotê:

- Ez beşê zêde bi vê keçika belengaz a dilbirîndar êşiyam ku bêheq û sebeb dilê wê kolan, Xwedê dilê wan bikole.

56

- Keça çî. kîjan keç dayê can?

- Kalê, canê min, Kalê!

- Êê çî bi serê Kalê de hatiye? Çî karê wan bi Kalê ketiye?

- Ez nizanim, bi xwe bipirse!

- Axir çawan? Çî Ji wan re got, ewan çî gotin?

- Qet kurê min, bi Xwedê, tu serê min Jêkî, ez ji te re nabêjim, tu bi xwe here û bi xwe bipirse, belkî ew bi xwe ji te re bêjin. Tu jî hinek berdilê

wê bikeve. Ev çî ye, giyana min mirov dibêje tu pê ne xweş î ku li vir mane, hêtîm e û her ji bo Xwedêye.

- Dayê, jixwe, bi Xwedê ez...

- Baş e. Baş e, kurê min, li gor dilê xwe bike, dijminên xwe jî kor bike.

Piştî xwarinê Camêr û Kalê li ser damê rûniştin û Ecê Jî ket firaqşûştinê. Bi destketina firsetek re, Camêr ji Kalê pirsî.

- Vê beyana han, li mala mamê min çî qewimî, li gor gotina dayîka min, wan te tûşî nerehetiyê kirine.

Kalê bi matî û şermokî serê xwe ji ser texta damê hilda û ji hêdîka ve got:

- Xaltiya min ji te re behs kiriye?

- Ne, bi Xwedê, tenê ewqas ji min re got ku tu jî bêxwîdan demeketiyî..

- Qet haya min lê nebû.

- Baş e, axir çî bû? Çî got?

- Çî ye? Wê ji we re xeber gotin? Nexo dîn nebû.

- Ne, xeber negotin. Ya rast ne di cî de bû, ez pê re biçim. Neyse tiştê bûyî, bû. Ji xaltiya min Ecê bipirse, bila ew ji te re qise bike.

- Wisa dixuyê, hûn dewrê destên hev dîkin, ew dibêje ji wê bipirse û tu jî dibêjî ji xaltiya min. Tu dê bi Xwedê ji min re bêje, ez bizanim.

- Ger tu dev ji min berdî, ez hez nakim bêjim.

- Baş e, ez dev ji te bernadim!

- . . . wê got... ez nizanim çî got. Bi Xwedê ez nabêjim.

Bi gora bavê te. Tu bi Xwedê serê xwe li ser

57

neêşîne!

- Baş e, qet, tu xwe aciz meke û mebêje.. Bavo min dev jê berda, bi serê te û bi gora ejdad û bav û kalên te. Ew jinmama min her ker û pozbilind e.

Axir ji ber vê ye, ez qet bi ser wan de naçim û nayêm.

- Nexêr, ne bi vî awayî bû, tu jî ewqas mezin meke...

- Baş e, ez dizanim tu keçeke baş î, ji ber vê, tu wiha dibêjî. Baş e, bila wisa be.

Camêr, çendîn ev mesele diket bîrê û hiş û mejiyê wî dervediket, lê soz dabû dayika xwe ku êdî ji vir şûn de behsa vê meselê neke. Ji bilî vê, dem jî ne ya wê bû, ku li ser bisekine û dirêj bike. Eger bixwesta jî, rûyê wî nedida, li gel jinmama xwe van cure meselên di hişê xwe re derbaz dikir, biaxive.

Eger wî bizanibûya dê ew keça xwe bi ser û pê xemilandî jî bidinê. Vêca, nexasma ji vir şûn de ku li

'gor gotina dayîka wî. ewqas tişt gotine û kapê şekiran şttcandiye. Bi rastî jî jineke bela ye, mirov nizane jê derbixe ka gelo çi dixwaze û çi naxwaze.

Çi pê xweş e û hez ji çi dike. Dema tu karekî li gor dilê wê bikî û lê xweş bê, bi hemû hezkirinek dikare dilê xwe li ber te veke û ber bi te ve bê.

Gavên wiha de, wekî cenaze bi ser te de tê û dikeve serzenîştan ku ji bo çi wiha kir. Jinmama wî bi vî awayî ye, Laweyê giyan jî -Xwedê wî biparêzeji



xwîşka xwe zêde ditirse, yan wekî bi xwe dibêje,  
dilê wê divekire. Ew yek jî, ne ji ber wê ye  
ku hez bi karên wiha dike, ez qet bawer nakim, ji  
van kirinên dayika xwe dilxweş be, her bila dayîka  
wî jî be. Ew dixwaze piçik piçik ji wê serweta bavê  
wî ya li ber destan e, bikêşe. Heta jina wî bi xwe jî,  
wê par jê re anî. Di vê dema me de, dayik jin ji  
mêrê re bîne? Tu bi xwe jî dibêjî çawan dibe  
keçeke sipehî ya ciwan bi hêviya anînê be, tu biçî  
li ser gotina dayîka xwe keçeke naşirîna nexwendewar  
a ji xwe çend sal mezintir bînê û bêjî, ev çi  
ye, ew keça xalê te ye! Ne dûr e, jinmama wî Fatmexan,  
qusurên wê jî jê veneşartibe, wê digot,

58

"kak Laweyê giyan, ev keçxala te ye, eger tu neynî  
dê kî bîne?" -Malê qelb para xwediyê xwe ye- bi  
Xwedê jin hemû wek hev in û hemû yek tahmê didin!  
Wek mesela hingivînê ye ku jinikê sed cur  
xwarin ji bo mirovê zalim ê jê hez dikir, jê çêkir,  
heta wekî wî tê bigihîne ku di hêla laş, sipehî û  
şêrîniyê de jinik hemû wek hev in.

Madem mesele wiha ye, ya baştir ew e, derxuma li  
ser devê dîzikê her bila li ser devan be, meselê ji  
zeman re bihêle ka dê çi jê bike. Çunkî hinek caran,  
ew bi xwe, ji me baştir rê dixê, wekî tiştê  
netîca kar e ku bigihînin fêkî, dar û beran. Her  
çawan be, da em bizanin bext û çarenivîsa kî bi  
serê wî vedibe!

Pîrozxan hat mehkemê. Mirovê zorker hat berdan. Yek ji mirovên wî panzdeh sal hukum danê û xwestin, piştî çend rojan bi Kalê re biçin gundê xwe. Camêr û dayîka xwe gelek bi vê ne xweş bûn. Ecê gelek ket pêşîra Pîrozxan ku qasek din jî qet nebe, heta mesele ji bîra wan here, Kalê li mala wan bihêle. Lê Pîrozxan jê re got:

- Ji vir şûn de, piştî ku mirovekî axê ji aliyê mehkemê ve hat cezakirin, êdî ev bû xwîn ket navbera me û ew axayê xwînmij vê ji bîr nake. Em ê herin ser gundê xwe. Xwedê xwediyê bêkesan e. îro jî nebe her divê em herin.

Mesela çûyîna Kalê ji dayîka wî zêdetir tesîr li Camêr kir. Yekem car piştî çûna wan, dema ew çû malê, çavên xwe li dorûberên xwe gerand, ecêbmayî ma, li wî ciyê ku ne tenê di mal de, di jiyana wî de jî ku valatî çêkiribû. Hemû tişt di mal de tarî, şikestî, kevin û naşirîn dihat ber çavan. Ne tenê ev, te digot, wî tişteki wenda kiriye û bi wî awayî di odê de dihat û diçû. Ji van tevan jî ne xweştir ev bû ku wî cesaret nedikir dîqqeta xwe berhevê ser dilê xwe bike, heta ku bizane ji bo çî li ser çûyîna Kalê evqas bîhteng û peşmurde

59

bûye, mala wî ket bîrê, bi çî hal û awayî be, nû çûbû. Wekî sitêrka rijandî demek asîmana jiyana wî ronî kir û çû. Xwedê dizane carek din çawan, kengî û li ku çavên wan ê bi yekûdu bikeve. Ewan

di temamê van salên xwe de tenê carek yekûdu dîtîn û ew jî bi vî awayî, ne dûr e ku di temamê jiyana xwe de carek din Jî bikarin hev bibînin. Demek bi ser çûna Kalê û dayîka wê re derbaz bû. Ciyê wan di dil û mala wan de valatîyek mezin çêkir, ev valatî wekî mehfurek bi qîmet a hêja ku mirov ji ciyê wê hilde çawan be, bi wî awayî bû. Êvarek Camêr li qulûbê rastî hevalemî xwe hat, wî jê pirsî, gelo te dev ji jinanînê berda yan te dest bi ser Askola keça mamê xwe hildaye? Camêr jî bi awakî xemgîn jê pirsî: "Ji ber çi, çi bûye?" Lawik pê hesiya ku haya Camêr bi meselê tune, xwe bi nezanînê danî û gotê: "qet, hema mln jî pirsî". Lê ev bersîva han beyhude diçe, Camêr jê venabe û heta gotinê pê dide gotin. Jê re dibêje ku wî ji Hesenê Şêx Maruf seh kiriye, ew dike ku Askol ji xwe re bîne. Ev gotina han gelek li Camêr giran tê. Lê nade derve. Di rê de ew her li ser vê difikire, gelek pê xweş dibe ku di milek de derzek, valatîyek tê de bibîne û vê xeberê derew derxe, lê ji ber tîrêjên gotinên dayîka xwe û exlaq û tebîetê Fatmexana jinmama xwe, qet tu derzek tê de nabîne. Dikeve bîrê ku biçê li ba Laweyê kurmamê xwe û wî bibîne, lê dev ji vê fikrê jî berdide. Taze piştî ku kar ji karê derketiye û li gor gotina lawikê, şekir jî xwarine. Lawe eger bixwesta, qet nebe berê vê bûyerê, dikarî wî agahdar bike. Dê neyse ne tiştê e, ew jî dizane ku ciyê dayîka wî Fatmexan

hebe, kes guhê xwe nadê, dê bila pîroz be. Ev jî qebehetê wî bi xwe bû, diviyabû piştî wan gotinên dayîka xwe, ew vegeriya, biçûya ba wan û bingehê meselê bizanibûya ka keç didinê yan na. Ewê vê meselê kir terkexemî û sersarî, avêt pişt guhên xwe û wiha lêhat, divê guhê xwê nedê, qedera wan bi hev nehatiye nivîsandin.

Camêr dema ku gîhîşt mal, behsa mêrkirina Askol 60

di dilê wî de fikir pite pit ku gelo ji dayîka xwe re bêje, nebêje..! Piştî wî nedixwest dayîka xwe bixe tengiyê û nîşan bide ku ew bi xwe jî ewqas bîhteng e, çî dibe gelo bila carek jî gotinek ji dayîka xwe re nebêje! Qey kafirstanî ranabe! Li ser mesela Askol û zewacê, dayîka wî ket bîrê ku ne dayîka wî û ne jî Kalê jê re negotin ew gotin çibû ku Fatmexana jinamama wî ji Kalê re gotibû û dayîka wî jî ewqas jê diqehiriya. Çû li ba dayîka xwe ya delal û bi berkenînek neşêrîn jê pirsî.

Dayîka wî di serî de dest bi kenek bilind kir û pişt re wek tiştê nexweş bi bîr bîne, nefesek kişand û bêdeng ma. Camêr pirsî: Ev çî ye, dayê, çî bi bîra te ket? Dayîka wî jî bi madekirî got:

- Ya rast kurê min, Kalê û Pîrozxan ketin bîra min.

Camêr gotê:

- Dê baş e, niha wextê pite pitê nîn e, tu behsa wan ji min re bike.

Ecê gotê:

- Fatêya kevnehirç a jinmama te dema çavên wê bi Kalê ket, pirsî; we bûka xwe aniye, hûn nîşanî me bidin! Hîştâ zû ye, dibû, piştî zarokanînê, we bianiya û nîşanî me bida.

Camêr bê ku guhê xwe bide gotinên dawiyê, serê xwe kir ber xwe û çû ket oda xwe. Li ser nivînên xwe, wî herdu destên xwe danî bin serê xwe û çavên xwe kir arîkan... Jinmama wî zanî ku wî Kalê ji xwe re aniye... Êê niha ez têgihîştim, ji ber çî, bi wî awayî, bi tundî pêşwaziya dayîka min kiriye û ji ber çî jî, bi vî awayî, bi lez, Askol daye mêr. Lê nee, ew li ser bahanan bûn, bêguman, eger dayîka min bi xwe tiştêkî wiha ji wan re gotibe, jixwe, her ber bi şaşbûnê ve çûye. Ji bilî vê jî, piştî Kalê û dayîka xwe çûn mala xwe, mimkun e bizane ku ew diçin babaniyê, ne... ev nabe, ew dikare ji kurê xwe Lawe bipirse. Dûr nîn e, ji gotinên wî jî bawer neke, çunkî ew Lawe her tim alîgirê min dizane. Ne lo, ev ên han hemû gotinên vala ne, ew li ser bahanan bûn û bêdengî û terkexemiya min jî alîkariya ev bahanên wan kirin.

61

Çend roj bi ser de derbaz bûn, sibek, berî çûna Camêr li dayîrê, dayîka wî bi çayê re mijûl bû, zarokek deh-danzdeh salî ket hindûr û pirsî: "mala Camêr ev e? Min şekirê şerbeta mala Fatme Xanimê ji wan re aniye", got û pakêta şekirê danî ser hesîrê, bê wê hêviya bersîvê bimîne, çawan hatibû,

bi wî awayî, derket derve.  
Ecê wekî kevir û darên banê bi ser serî de bên  
xwarê, bi wî awayî bû. Şekirê mala Fatmexana çi?  
Fatmexan bi heyî û tuneziya xwe. gumanê serê  
Askol dike û sozê wê jî bi Camêr daye. Belkî Fatmexan  
wê yekê kiriye û gotina ku xelkê digot rast  
be. Bavê min. gotin vala nayên gotin. Dûkel bêagir  
nabe. Ewan digot, Askol didin Şêx Hesenê kurxalê  
wê! Rizayê min bi rizayê Xwedê. Bi Xwedê, ez ji  
milek de jî pê kêfxweş im ku ev bela ji ser me  
rabû! Em jê rizgar kirin û nedan. Qeyî nake, lê  
tenê ya li însan giran tê ew e ku navê Camêr li ser  
bû, hegene Xwedê rehmek bi ser de anî ku ji keça  
Fatmexan rizgar kir. Xelk şimika me maçî dikan  
ku keça xwe bidin me. Bila bizanin kî ji me zarar  
kiriye! Bila Xwedê yar be, ez ê keçek jê re bînim  
ku heftê kesên wek Askol bi mizgîniya wê neynin...  
Di vir de melhezên wê serûbin bûn û serî lê gêj  
bû, ewqas keç kirin ser perda hişê xwe, ji nişka  
ve wek ava ji serokaniyê herike...lê divê wan  
şekiran paşde vegeîne. Keça çi, qey tu heya û arr  
bi vê Fatehanê ve heye? Were, qet şerm û heya  
neke, şekiran ji me re bişîne! Baş e, dayîka min,  
me biqehirîne. Xwedê kumê xemgîniyê daniye  
serê me. Xelk jî ji xwe re xwediyê Xwedayek e. Ew  
Xweda tenê Xwedayê we nîn e... Serê her tiştî  
Xwedê. Xwedê li min negre û li ser min kufur hesêb  
neke, Xwedayê dewlemenda ye! Erê ji bo çi

dibêjin Xwedê daye wan û... estexfurullah, bi bê rizayê  
Xwedê van nî'met û waridatan nedane hev!..

Keçê tu çi dibêjî, waridat û nî'metê çi, hemû yên  
pife bayek gur in. Rûyê kesekî nas negirtiye ku ji  
me re du dendik şekir bînin, ji ber vê dane destê  
yek ji wan kesî nenas ku min nezanî ji ku re der-  
62

ket û çû, min du xeberên qelew bi wî re ji Fatexanê  
re bişanda û şekirên wê jî bixista!... Çi dibe bila  
bibe, ev ji Fatexan re namîne. Da vêca ez van  
şekiran di heft konan de bivişêrim ku çavên Camêr  
ê giyana min pê nekeve. Bêguman dê gelek lê  
nexweş bê.

Piştî nîvroyek ku Camêr nanê xwe xwaribû û xwe  
li ser ciyên xwe dirêj kiribû û rojnamek girtibû  
destê xwe, fikir ku xew bikeve çavan, dengê otomobîlek  
di kolana wan de hat -wek ku gelek kêr  
otomobîl tê re derbaz dibûn. Nexêr otomobîl sekinî  
û li deriyê wan jî dixin, wî qasekî xwe bêdeng  
kir ji bo ku dayîka wî biçê. Lê beyhude bû, li derî  
dixistin û dayîka wî jî di piyasê de tune bû. Muheqqeq  
bi tiştêkî ve mijûl e, ne Jidil rabû û bê pirs  
û deng derî vekir. Gelek bi rûyek şadî û ecêbmayî  
dev û çavên wî geş bûn. Bi dengekî gelek ji pêwistiyê  
bilintir got:

- Ev hûn in, wey hûn bi xêr bîn.

Bi awakî gurc, wî li dêmenê hemberê xwe bê cî  
qêjiya û bi awakî şermokî got:

- Ev çî ye? Pîrozxan we xêr e? Ya Xwedê hûn bi xêr bên, kerem kin jorê. Dayê were eva Pîrozxan û ... ewhatin.

Kalê ket ber milê dayîka xwe û anî jor û Camêr jî eşyayên wan hilgirtin ku muawênê şofêr hildabû û danîbû ber deriyê wan.

Piştî panzdeh roj derman û doktoran, Pîrozxan ber bi başbûnê ve çû. Di vî navî re, Camêr xizmeteke bi mêranî kir, hetta di germiya nexweşiyê de, li gel Kalê, bi dor kar dikir, ji bo ku di wextê de dermanên wê bidinê. Ev têkiliyên han, şermên li ber çav û bê cî yên di navbera wan de rakir û gelek li gel Kalê xwe nêzîkî hevûdu kirin û şarezatiya wan a li ser exlaq û mîzacên hev zêde bû. Gav bi gav, li gel pêşdeçûna başbûna Pîrozxan, giryên dev û lêvên wan jî vebûn. Şerm û fihêtî di navbera wan de nema. Heta nexweşê wan wekî berî lê hat, ew jî car din vegeyriyan ser rojên xwe yên berê, çûna Kalê li gund. Camêr, tenê dema goti-

63

nên jinmama wî Fatexan bi bîrê diketin ku ji Kalê re gotibû, li hemberê Kalê bêdeng dibû û serê xwe dikir ber xwe. Wek ku ji Kalê re gotibû... Ev serîkirina ber xwe û bêdengî Jî her di destpêkê de ji ber şermayê bû. Lê di dawiyê de bûn peywendî, xeyal û xweşî di navbera wan de. Bi rastî, dibû wiha nebûya. Tu wext Xwedê zewacê ji kesekî re bi vî awayî bi hêsanî û rehet nesîb nekiribû. Ji bo



kî nazdar û nazikeka wiha bi pê xwe ji wî re aniye mal. Her wext di halên wiha de ew şîira erebî bi bîrê diket ku di wextê xwe de di "Hezar û Yek Şev" an de xwendibû ku digot:

"Xwedê dikare du kesên ji yekûdu cuda bigihîne hev,

Di demek de ku bi hemû baweriyên xwe, li ba wan wisa be ku tu carî êdî çavên wan jî bi yekûdu nakeve".

Bi rastî tesadufek nedîtî ye. Lê binêre, Kalê dê ji nişka ve di demeke wisa de vegere ku Askol mêr kiribe, ew û dayîka Kalê. bi lez bi zewacê digerin. Ji xelkê we ye, 1i bo ku ew gotinan bi ser xwe de bibrin, çî jina dest bikeve, çendîn sipehî nebe jî, ew lam û cîm jê re nakin. Lê mirov çawan dest pê bike. Carek kî dibêje ku kesekî di dilê Kalê de nîn e? Na, ne wisa ye. Ger yek di dilê wê de hebe, ev ciyê pêkenînê ye. Jixwe niyeta wî nîn e vî karî han jî bi dayîka xwe bide kirin, her çendîn fermana dayîka wî di vî karî de tenê axiftin be jî. Lê ka carek bila derûdorên xwe biceribîne, wê çaxê dê bi dayîka xwe re biaxive. Lê çawan, çendîn bir û anî, nekarî xwe ji vê astengê rizgar bike, çawan rûyê wî bigre ji Kalê re bêje, " bi min re bizewice." Dê ka bila qasek din jî bi ser re derbaz be, belkî şerma wî bireve. Wî carek, du caran ceriband, lê feyde neda. Camêr di vê sergêjiyê de bû ku rojek li gel Kalê rûniştibûn û dame dilîstin, gelek bi hişyarî jê re got:

- Tu dizanî dayîka min gotinên Fatmexan ên ku ji te re gotibû, ji min re got...

Kalê serê xwe bi ser texta damê de xwar kir û qet 64

tişteki negot, lê reşahiya berkenîna dêmenek ji birûskê jî bi leztir di hişê wê re derbaz bû, bi lez kevirek bir pêş ve. Camêr wê demê baş li ser fikirî bû ku gotina wî dê çiqas av hilîne û çiqas 11 ser Kalê tesîr bike û vê yekê firset zanî û got ku nabe vê firsetê ji dest birevîne. Ji ber vê, bi awakî hîşyar bi berkenînek bi şerm û lertzok, gotê:

- Ez dibînim tu qet qise nakî. Carek tu kevirê xwe paşde bikişîne, ev firsetek mezin e, ez ê damebikim...

Hinek bi tundî û bêyî serê xwe li ser texta damê hilde, Kalê gotê:

- Qeyî nake, ez paşde venagerim. Dame bike.

- Baş e, giyana min, ji bo çi tore dibî, mîna tişteki xerab negot.

Yekem car bû ku karî ji Kalê re bigotaya giyana min, 1i ber vê, bi şid, kevirek bir pêş.

Kalê bêdeng bû, dikir ku kevirek pêşde bibe. Camêr têgihîşt ku şermayî dike û firseta han jî di bin destê xwe de mirar bike. Destê xwe li textê damê xist û piraniya kevirên wê xist xwarê...

Hinek bi tengî û zehmetî ku bikare şepirzetiya xwe pê veşêre, got:

- Bes e dame, êdî em hinek ji xwe re biaxivin...

Kalê ber bi berhevkirina kevirên damê re, navek re serê xwe bilind kir û bi serzeniştê berkenîn got:

- Tiştêkî tune, em biaxivin. Tu ber bi xisarê de bûyî, ji ber wê te xera kir...

Guhên Camêr li gotinên wê nebûn, hemû hiş, serinc û mejiyê wî di geroka memikên Kalê yên sing û pêsiirên îdrasên wê bilind kiribûn de bûn. Ew memikên Kalê yên ji singa wê derketî, wek bi van nêrinên Camêr pêlê êrişên germahiyê here ser û bişewitîne, bi wî awayî Kalê bi şid kevirên damê danîn erdê û destê xwe kir pêsiira xwe û rabû ser piyan, bawîşkek, her tenê Xwedê bizane, rastî bû yan bi zanetî. dan xwe, got:

- Ka ez herim hinek xewa xwe bişkînim, şev xew li min heram bû, hemû bi ser hev ez du-sê seet 65

nerakitim.

Eqil di serê Camêr de nema, rabû ser xwe, destê Kalê girt li ser kursiyek da rûniştandin û bi lez gotê:

- Tu naxwezî, em gotina Fatmexan bi cî bînin? Kalê fikir ku jê re bêje "kîjan gotin", lê ku ket bîrê, şerm û fihêtê gotina wê di gewriya wê de asê kir û serê xwe kir ber xwe, Camêr vê firset zanî û gotê:

- Êê... giyana min, tu çi dibêjî?

Piştî qasek bêdengiyê, Ji hêdîka ve û bi deng bilindkirinek

bêzarane ya nexweşî wê got:

- Ji bo çi. bêjim çi?

- Ji bo em wan gotinên Fatmexana jinmama min bi cîbînin.

- Ez nizanim çi bêjim, dayîka min dizane.

Wê wiha got û lêxist derket derve. Lê ji çavên Camêr nerevîn ku wextê ew ji odê derket derve, di bin rengê wê ya sorgulî de, reşahiya dêmeneke berken a şêrîn di rûyê wê de bibîne.

Piştî wê rojê, bi hefteyek, hemû bi ser hev ketin hesaba zewaca Camêr. Hetta wextê çûna Kalê û dayika wê jî, ji ber bahana nexweşiyê, xistin zivistanê.

Pişt re ew vegeriyan gundê xwe...

66

Camêr nedizanî geşta wî ya bîranînan çend kêşa, çunkî ber bi vê re ketibû xew... Dema ku ew hîşyar bû, wî li seeta xwe ya li ser masê nêrî piştî nîvroyê bû. Di dilê xwe de got, "bêguman Lawe ku ji bo xwarinê hatiye mal, niha karê şandina pê zarokan hemû cîbicî kiriye". Çarîk seet bi ser de derbaz nebû, jina Lawe hat ber derî û jê re got:

- Ez ditirsim, Lawe neyê nanxwarinê, wext jî dereng e, ez ji te re nan têkimê, êdî baştir e, ji vê zêdetir em çaveriya wî nekin.

- Qet rojên din jî bi vî awayî ji bo nanxwarina nîvroyê nedihat?

- Ne, ez nizanim vexwenandinek hebe, wê çaxê jî di pêş de me agahdar dike.

Camêr serê xwe hejand û got:

- Bêguman bi karê min mijûl e... dê baş e ez jî ewqas birçî nîn im, em ê seetek jî li hêviyê bimînin.

Ber bi êvarê bû, Camêr di odê de bi awakî şepirzetiyekek aşkera dihat û diçû. Çi kesê li derî bixistaya bi wê hêviyê ku Lawe ye û bi zû wî bi deng û behsa çûnê agahdar bike, bi xwe derî vedikir. Ewqas derî ji xelkê re vekir taqeta wî nema û çû oda xwe, hîn rûneniştibû Lawe hat. Guhên Camêr her ser dengê bû, bi lez û bez wî xwe gîhande balê, lê dema ku çavên wî bi matî û peşmûrdetiya Lawe ket, qesra hêviyên di dilê wî de hilweşîyan.

67

Bi awakî perîşanî jê pirsî:

- Gelo çi bû? Te kesek şand?

Lawe destên xwe pan kirin û ji ber xwe ve bile bilek kir. Ev rewşa Lawe wekî gelek hêrsa Camêr rakiribe, hinek bi tundî gotê:

- Çi? Ez tê nagihim. Ji min re bêje, bi rastî te kesek şand pê wan de yan na. Ji bo çi tu rastiye ji min re nabêjî?

Dema serê xwe hilda, çavên gelek şermezarî û rengê bizirandî yê Lawe dît, îmkana tirsek hîn ji vê jî nexweştir nedê, xwe bi xwe xav bû û wekî ku rica bike gotê:

- Li min bibore bira giyan. Nabe tu li min bigrî.

Tu nizanî ez çi qas bêriya wan dikim. Bawer bike di

van deh salên han hemû bi ser hev de, qasî vê şev  
û rojê min bêrtiya wan nekiribû. Her çi xem, xweşî  
û hêviyek min hebûn, bi naçarî tefiyan. Parêzgeriyên  
van çend salan ên di dilê min de hebûn bi  
carekê bilweşiyar. Êrîşek tund û tûj anîn ser min.  
Ez nizanim ka gelo çi bikim. Ez dikim ku dîn bibim.  
Di ciyê nan, av û hewayê xweş û şadiyê de, ji  
vê jî pêştir, ji hemû tiştên dinê zêdetir ku min di  
zîndanê de xema azadiyê dixwar, niha ez ji van tevan  
zêdetir hesreta wan dikêşim. Li min negre,  
eger ez bêjim, ji ber wan û Ji bo nêzîk ketina ba  
wan bû, min hez dikir ez bêm vir. Yan na min gelek  
baş dizanî, çi tirs hatina yekî wek min di hatina  
vir de heye. Ji ber vê, min bîryar daye, dema ku  
ez bêm girtin ez ê daxwaz bikim ciyê min a binçav  
girtin de veguherînin bajarek din ku heta behsa  
şoreşê jî tê de neyê kirin! Ger çendîn ez pê ne  
bawerim vê yeka han ji min re bikin. Çunkî gelek  
caran ez li ser difikirim ku ji bo çi min bi vî awayî  
bi hêsanî û rehet anîn li vir. Li vir jî bê çavdêriyek  
pêwîst azad kirin. Sebebê wê ew e ku li gor xeyalên  
xwe min bikin davik û xelkê dilxwazên şoreşê  
pê bidin girtin.

Ev gotinên Camêr li ser Lawe wek mirov xwê  
têke birînê, bi wî awayî tesîr kir û axînek kêşa û  
got:

68

- Ez dizanim giyana min, her çi tiştê tu dibêjî û

hîs pê dikî, hemû di cîh de ne û rast in. Ez bi xwe  
gunehkar im, dibû min nehîştaya ev karê han bi vî  
awayî lê bê. Niha jî çî dibe bila bibe, em naçar in  
ku bizanin ka ev dê me bi ku de bibe. Ez gelek geriyam  
û pê ketim û her tenê ew kêmbû ku ez xelkê  
bidim ber pahniyan ji bo ku biçin Gulan. Xelk  
dibêjin di van rojên dawiyê de şer ketiye wan  
navçan û beşek jê ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye  
îşgal kirin. Du noqteyan danîne ser wan şeqamên  
ku giranahiya xelkê tê re derbaz dibin. Eger ji vî  
milî de kesek bi serê xwe, bi çî halê be bikare  
xwe ji noqteyan bide alîkî û derbaz bibe, dema  
vegera xwe de bi jin, zarok û heywanê barkirî ve  
vegere, dikeve ber qemçî, şeqam û lêdanek wisa  
ku her tenê Xwedê dikare bigihîje hawara wî kesî.  
Lawe ku tirs û sam di çavên Camêr de dîtî,  
dom kir û got:

- Mimkun e jin û zarok bi peran bîn xelas kirin,  
her wisa ew mirov jî dikare bi saya serê wan ve  
xwe derbaz bike, lê kî amade ye xwe têke vê agirê  
han Tu çare nîn e, dibê em lez nekin, firset bide,  
em hinekî din li ser bifikirin.

- Axir...

- Tu çare nîn e birayê min, divê em pîlanek jê  
re bibînin ku ne em û ne jî ew kesê ku bi pê wan  
de biçê, dûçarê felaketek bibin.

- Tu rast dibêjî, lê tu çî dikî bike, ez rica ji te  
dikim, hinek lez bike, baş e ku rewş wek tu dibêjî

wisa be, dê kî bi pê wan de biçe. Mimkun e kesek wisa bi destê me nekeve.

Lawe serê xwe hejand û jê re got:

- Dê ka em bizanin, em ê çarek jê re bibînin, gelo ka kesek ji xizm û nasên me dest nakeve. Ji ber xwe ve got: her çawan dibe bila bibe hewceye ez zûtirîn dem xwe di bin vî barê derînim. Divê tu jî hinek xwe lê bigrî û sebir bikî û serê min neêşînî.

- Baş e, babo êdî ez tiştek jê naaxivim, lê tu jî navêje pişt guhên xwe.

69

- Madem wiha ye, baş e em jî dibirin, da vêca em bên ser derbazkirina şeva xwe. Tu çi dibêjî, ez hinekî areq û meze bînim û her em ji xwe re li mal rûnin qedehek vexwin û hinek xem û kulên dilê xwe bidin bayê. Wek ku tu dizanî çûna ji der ve, sînema û tiştek wisa nîn e.

Camêr piştî demek wek ku li ba Lawe nebe got:

. - Tu bi kêfa xwe yî, baş e haziriya xwe bîne vir.

Di dilê xwe de got: Herçend ez venaxwim jî lê hewce ye Ji niha de ez xeyala wê nekim, gelek pîs dixuyê.

Lawe qasî cigarekêşanek bi ser de derbaz nebû meze, areq û haziriya xwarina şeş-heft kesên areqxor anî odê ba Camêr û vêca bi xwe jî li hemberê wî rûnişt. Du şuşên bi kêfa xwe ji herdukan re tijî kir û got:



-Noş!

Camêr jî rahişt şuşa xwe, li hev xistin û birin devê xwe, lê bê wê ku tiştêk jê vexwe danê erdê...

Lawe got:

- Dê ka ez biçim radyo jî bînim...

Camêr bi toreyiyeke bê cîh de got:

- Ne tu bi Xwedê, dev ji radyoyê berde, taqeta min a guhdarîkirina deng û behsan nîn e.

Lawe bi awakî poşmambûyî gotê:

- Ne ji bo deng û behsan, ji bo kilaman, car û baran kilamên xweş hene.

Camêr wek ji torebûna xwe şerm bike, got:

- Baş e, ez jî hez ji kilaman dikim, bi şertekî ku tu nekî ser deng û behsan, radyoyê bîne.

Lawe radyo anî, hinek pê ve mijûl bû, lê qet kilamek xweş nedît, girt û got:

- Li tu cîhê tiştêkî nîn e, de em jî ji xwe re biaxivin.

Herçend ez naxwezim birîna te bikolim, lê vaye di saya Xwedê de tu rizgar bûyî, eger bîhna te teng neke, hinekî behsa jiyana û rojên xwe yê hepsê ji min re bike.

Camêr serê xwe kir ber xwe û qet tiştêk negot.

Lawe gotê:

- Herkes bi curek behs dike, mirov jî şaş

70

dimîne û nizane ka kîjan rast û kîjan derewe. Hinek kes wisa behs dikin, wekî ku Jiyana derbazkirina bendîxanê ewqas ne zehmet e.

Camêr têgihîşt çare nîn e, hewce ye tişteki bibêje,  
wî jî dest pê kir:

- Ya rast be, di zîndanê de ne jîyan û ne derbazkirin  
heye. Çunkî ne pêşdeçûn, ne xweşî û ne jî  
destxistina berhemê qîmetek maddî û manewî tê  
de ye, tenê roj û salkuştin tê de heye. Ne dûr e. Li  
ba hinek mirovên baş û qenc wisan be ku  
bendîxane cîhê başkirin û perwerdekirinê ye. Gunehkar  
tê de pak dibin. Kesên xwedî fikrên nebaş  
tê de tînan qenc kirin! Lê yê ku min dîtî, bi temamî  
zidê van tiştan bûn. Ew ên ku bendîxane di  
destê wan de ye, li gor wan wisan e. Ew her Ji bo  
tirsandin û eziyeta xelkê li wir hatine danîn.  
Ger wiha nebûya dê dezge û kesên baş li wir bihatana  
danîn. Ew kesê çavê wî muamelên karbidest  
û gardiyanên bendîxane û zîndanan neketibe, nikare  
vê rastiya han fahm bike. Li wê yekê jî ku  
însan tehemmula wî heye heta çî derecê hîsa mir:  
ovayetî, piyatî û şerefê di dilê xwe de bipelixîne. Û  
çawan ew dikare di meydana hovîtî û canewariyê  
de gurg, piling û wehşên din bide alîkî. Vêca eger  
rast bûya ku karbidestên welêt bi qasî misqalek  
rehma mirovayetiye di dilê wan de hebûya û daxwazek  
wan li ser başkirina wan ne di riya tirsandin  
û eziyetkirina girtiyan de, hebûye, wan ecniyên  
tirsê yê pîs bi ser wan de nedanîn. Wek her ji  
roja yekem a bendîxanê şûn ve daxwaz û nêrîna  
wan ew e ku bi hemû curek fikir û giyana

pêşdeçûnê bi ser wan de qut bikin û wan bipelixînin.

Ji bo ku heta hetayê wan serşor û sitûxwar

bikin, reh û rîşên bawerî bi xwe kirin û

serîhildanê bi ser wan de qut bikin. Ji bo ku tu

carî bi ser xwe de neyên, demarên baweriyê bi ser

de bixitimînin, rêz, camêrî û azayetî ji giyana wan

derêxin. Ji bo ku ne tenê xelkê li ber çavên wan

bidin reşkirin, wan bi xwe jî li ber çavên wan bi

xwe bidin reşkirin û xwe ewqas nizm, pîs, bêxîret

71

û bêqîmet bihesibînin ku ew newêrin di xewnên

şevan de jî fikra xirabiyek ji bo vê rejîma han bikin,

ewan segên kişkişkirinê bihesibînin û ne destê

xwe bi rûyê wan de bînin xwar û ne jî li dijî

wan rabin. Lê ev yeka han baş e ku ew hov jî û mezin

Jî di coniyê de av dikutin... Wan karakterê

benîademan nasnekirine û agahdariya wan bi qanunên

guherandin û pêşketinê nîn e. Ji ber vê ecêbmayî

dimînin û ziravê wan diteqe ku dema dibînin

di eksê armancên wan ên qirêj û kirêt ku bi hemû

awayî metodên hovîtî û neînsaniyetê bikartînin. Lê

çiqas diçe banga azadiyê aşkeratir û hejmara welatparêz

û azadîxwazan zêdetir dibe. Di nav cergê

tarîtiya wan zîndanên bi armanca xeniqandina fikir

û tirsandina giyanê ku durust kirine. Ji bo gihîştina

wan armancên xwe yên kirêt û pîs, her çi riyên

şeytanî yên bênamusiyê heye, bikartînin. Lê di nav

cergê wan zîndanên tarî û gemar de qehremanên

bênava gelek in ku baweriya wan a bi Jiyan, serbestî  
û serxwebûniya welêt ji çiyayê Bêstûn asêtir û  
qewîtir e...

Di vir de Camêr bîhnek veda. Lawe jî vê yekê  
firset dît û gotê:

- De ka firek şerbika xwe bide, niha sar bûye. Tu  
dizanî, bendîxanê çawan ser û çavên te guherandiye  
bi wî awayî bîr û baweriya te ya li ser siyasetê  
jî guherandiye. Bi bîra min nedihat ku piştî derketina  
zîndanê, tu di bin nivînên şevê de jî fikra  
siyasetê bikî. Lê çi heye ne kêr û ne zêde, tu  
şoreşgêriya rasteqînî diaxivî. Ev çi ye, mirov dibêje  
tu venaxwî, şerbika te her di cihê xwe de ye.

Camêr bi germiyek lavahî ve gotê:

- Tu çi dibêjî kekê min! Ew hukmê neheqî yê  
narewa dan min. Ew derd, elem, êş û eziyeta bêheq  
û bêsebeb bi ser min û mal û zarokên min de  
anîn. Ew eziyet, îşkence û kirinên pîs û kirêt ên  
di zîndanê de bi me hat kirin û niha jî bi xelkê me  
tê kirin. Daxek daniye ser giyana min ku heta ew  
dax li serê be û heta ez li ser rûyê vê dinê bim, ez  
ê dijminê xwîna vê rejimê bim ku xelkê bi vî awayî  
72

neheqî û beleheq û sebeb davêle konê zindanan û  
însanan di wan rewşên pîs û kirêt de dide girtin.  
Bi awakî nemerdî û neînsanî bi wan re hereket  
dike. Lê ez ê çi bêjim, ez nizanim ez ê Ji zemanê  
re çi bêjim. Tu dibêjî xwîna wê alozî û tîkelheviyê

li ser min e, wexta xwekuştinek peyatiyê jî nade min. Ez çiqas fikra bêkesî, êxsîrî û şerpezetiya Hêwa û dayîka wî dikim, nefesa min diçike û qudumên min dişkên. Destek min dikeve vî milê min û yê din jî dikeve wî milê din. Gotineke min tenê dimîne, hewcebû cîh û warê min ew çiya û şax di nav "L.A.N" de bûna. Biryara min ew bû ku di rezên yekemîn ên şerkerên riya azadiyê de li dijî vê rejîma han a genî şer bikim, heta mirin an serkevtinê xebat bikim.

Tu dibînî kekê min, ez çendîn bedbext im. Azadiya min a mirinê 1ê nîn e. Çi tiştê ku ez lê rast tîm, qet bext û talîh tê de nîn e. Baş e bavê min, ez Ji bo jiyana xwe bextiyarî naxwazim, lê ji ber çî ji bo mirinê bext bi min re nabe yar, nahêle mirinek bi dilê xwe bimrim?

Lawe ku dît Camêr bi rastî bi van gotinan birînên wî yên hîn qalik negirtî dikole, baştir zanî mewzuyê biguhere, ji ber vê gotê:

- Tu dikî bi van axaftinan xwarina me ji bîra me bibî, ev çî ye?

Wî dest avêt şerbika Camêr, girt destê xwe û di cîh de gotê:

- Ne giyana min wiha nabe. Fermo ka firek baş lêxe. Wexta min wiha derbaz dibe.

Camêr bi awakî matî gotê:

- Niyeta min tune, ez vexwim.

- Ji bo çî, te sond xwariye?

- Ne. Her wisan. Ez jê hez nakim.

Camêr vê gotina han ewqas bi azarî kir, Lawe baştir zanî ku bi ser de neçe. Şerbika xwe rakir serê xwe û yeka din ji xwe re dagirt û gotê:

- Tu bi xwe dizanî ku tu xwediye malê yî. Tu vexwî û venexwî ez ê behra xwe ya şevê vexwim, sê qedeh, ne kêr û ne zêde. Wisan li dinê hatiye

73

çûn û hatina xelkê bi ser hev de û çûna çayxanan û geranê nemaye, min jî serî daniye ser areqê, ka ez izanim, guherandinek xweşî û şadiyê tê de nabînim.

Lawe dest avêt xwe, bi radyoyê ve mijûl bû û neaxift, destê xwe ji ser hilneda heta kilamek azerbeycanî dît û gotê:

- Ev jî xweş e, tama kurdî dide, ez nizanim li te çawan tê lê gelek xweşa min diçe. Her bi rastî jî kilamên vê navça Rojhilata Navîn ewqas têkel bûne, bi taybetî yên kurdî, tirkî û azerî mirov nikare ji hev cihê bike.

- Li gor min, gelek meqamên kilamên tirkî ji yên kurdî hatine wergirtin, her wekî çawan ji xelkê Kurdistanê re "tirkên çiyayî" dibêjin, ji kilaman re jî "şerqf'yên tirkî dibêjin.

-Vêca Kurdan çiyê xwe karîne biparêzin ku heta kilam û musîqa xwe jî bikarin biparêzin? Mirov ku bi xwe tune be tiştêkî wî jî çênabe, mala wî bi ser malan de têt dabeş kirin, xêr û bêrên wî jî dibin

talan! Di dirêjahiya dîrokê ve heta niha, çendîn mirovên bikêrhatî yên Kurd hebûne, di hemû warên çalakî, pêşkevtin û zanînê de xizmeta biyaniyan kirine. Lê çi heye hîn min nedîtiye kesek biyanî ji bo tiştek xizmeta kurdan kiribe.

- Wisa dixuyê, kurd ji gelek berî ve di pêşiya xelkê de xwedî bîr û baweriya mirovayetiye bûye û dev ji nijadperestî û neteweperestiyê berdane.

- Na bi Xwedê, lê ji bo dilê te bila wisan be.

Bi van cure gotinan, wan seet kirin deh, nan xwarin û piştî qasek rûniştin, xwe ber bi mijûlkirina radyoyê ve, Lawe jê re got:

- Tu dixwazî, dikarî rakevî, ez ê radyoyê bibim û guh bidim ser deng û behsên Qahîrê.

Camêr gotê:

- Baş e, bibe, taqeta min a guhdarîkirina deng û behsan nîn e.

- De şevbaş û xewxweş.

- Şevbaş, baş e lê ez ji xewa xweş bêzar bûme, bes e êdî ez ê hinek hez ji rastiyên xweş bikim, ez

74

hez dikim, hinek ew xewên min ên xweş paşde bîn. Ji destê zindîbûna xewên xweş wek serxweşan li min hatiye.

- Ez va deh sal e, ewqas ji heqîqetê bêzar im ku wext e, ji bo xewek xweş bişewitim.

- Dê baş e, şevbaş û xewxweş! -Wî li seeta li ser masê nêrî- lez bike here, deng û behs nerevînî.

Heta tu antêna hewa û axê tê re bikî nîvê xeberan derbaz dibe.

75

Serê sibê piştî çayvexwarinê Lawe Ji Camêr re got:

- Ev çî ye, mirov dibêje îro jî daxwaza te tune, tu derkevî derve. Ne giyana min. wiha nabe, rabe here xwe qasek biguhere. Min ji te re destek kincê xwe daniye wir, mimkun e ji te re hinek mezin be, lê ji yê te yê niha baştir e heta em herin ba tarzê destek kinc ji te re bidirû.

Camêr hinek bi toreyî gotê:

- Ez kinc naxwazim, kincên min baş in, ez naçim ji bo şahîniyê... Ger ez herim ji derve her ez ê bi van kincan derêm û ez kincên nû jî çênakim heta perên min çênebin.

Lawe qasek li ser û çavên azarayî yê Camêr nêrî, serê xwe hejand, qet neaxift û lê xist, berê xwe da, çû karê xwe.

Piştê çûna Lawe, Camêr zêde li mal nema. Kincên xwe yên kevin li xwe kirin û derket derve. Di destpêkê de, te digot, yekî wek ji tiştêkî şerm bike, bêarmanc ji vê kolanê diçû kolanê din. Piştrew ket gerîna şeqaman, lê wekî gundiyeke yekemcar bajêr dîtî, çavên xwe dikir camekanên dikanan, koçan û kesên di caddan de diçûn û dihatin. Ew tiştê zêde dîqqeta wî kêşa, gera eskerên çekdar ên cût û cût bi hev re yên di şeqaman de



digeran û otomobîlên şeştîr li ser wan ên di koşe  
û meydanên çarriyan de dabûne sekinandin bûn.

76

Van yekan roja berdana wî ewqas dîqqeta wî  
nekêşabûn.

Gelek ji dûr ve Aso Mendî xuyakir ku yek ji wan  
hevalên wî yê herî nêzîk bû. Bi berkenînek şêrîn,  
ew ber bi wî ve çû, lê Aso qet mûyek ji xwe şaş  
nekir, bi yekcarî jê derbaz bû. Camêr wekî tu tasek  
ava sar bi serî de bikî, wisan lê hat. Piştî çend  
gavan ji nişka ve bi bîrê ket ku ew çiqas guheriye.  
Dema wî Aso cara dawiyê dîtibû, ew xortekî  
xwîngerm ê baş, xweşik, rûgeş û qît û zirav bû. Lê  
niha mirovek hişk ê sîs lê hatiye. Ma zimanê xeybê  
bi Aso re nîn e. Di paş de vegerî ku bangî wî bike,  
dît ew jî di pişt xwe de vegeriyaye û lê dinêre,  
wekî bêje ev dimîne biraderek, lê ki ye, li ku  
dîtiye yan li kê diçe? wî nezanî. Ji bîranînên xwe  
xeyidî û xwe neda dest. Camêr hê navê wî temam  
nekiribû, Aso 1i nişka ve ber bi wî meşiya, bi  
çareya surprîzeke xweşî û geşbûnek bi temamî ve  
gotê:

- Ev tu yî, Camêr? Ez bim, te nas nekim. Dê bila  
tu hezar car ji vê zêdetir jî biguherî! Ev an nîşana  
bêxêretiyê ye yan jî ya kalbûnê.

Camêr bi ken gotê:

- Ger tu ji bo kalbûnê bêjî tişteke bi te ve nayê  
xuyakirin. Min te çawan di cîh de hiştiye, tu eynî

bi wî awayî mayî. Lê ger nîşana bêxêretiyê be, vêca tu xwe ji min baştir nas dikî.

Aso bi ken gotê:

- Baş e şukur tu ji gotinên xwe yên xweşik venebûyî.

Wan destên hev girtin û vî milê û wî milê

din ên yekûdu maçî kirin, bi meraq û xwestinek gelek ji dil ve, Aso jê pirsî:

- Tu kengî hatî berdan? Tu kengî hatî? Wey tu

bi xêr be. Kuro bi Xwedê va demek dirêj e, tu di

nav me de nîn î, va çend sal e? Deh sal... bi gotin

xweş e... Êê niha tu bi ku ve diçî, ji xwe şayxana

Hebeş nemaye ku ez ji te re bêjim, em herin wir.

Ji bîra te çûye ku me konken li wir dilîst. Bi ser

çûna te gruba me jî belav û welaw bû. Her yek ket

ciyekî. Merwan hat kuştin. Elî hat girtin. Emîn

77

dest li ser e û li wan Jêran e. Şewket jî cihê xwe

guhert, ez nizamim ka çi bi serî de hat, ên din jî

perş û belav bûn.

- Êê 'Ebeyê çaycî çi lê hat?

- Gelek zû çayxana wî girtin, êdî wî nekarî xwe

rabigire, halê wî xerab bû û di van dawiyên de li

,ber koşa dikana xwe semawer û dezgehek danîbû,

dost û nasan li balê çay vedixwarin. Par zivistanê di

şeqama ... de xayînek hat kuştin, esker jî destavêtin

destdirêjîyên bi korane, pênceh gulle zêdetir li

'Ebe ketibûn lê digotin mêraniyek nedîtî kiribû.

Dema ku ew dibîne eskerek li nêzîkî wî jinek dikuje,

qet xwe lê hagire û semawera ava kelandî bi ser milê mêrik de dike, hemû ser û çavên esker dişewitin û kor dibe û eskerên din jî wî didin ber gullan. Niha ev bes e. Vaye ew mirov hatin, taqeta me ya bendîxanê nîn e. Tu niha bi ku ve diçî?

Camêr gotê:

- Qet karek min nîn e, her wiha ez ji xwe re digeriyam.

- Madem wisan e, bi min re were, em heta wî milî biçin. Hinekî karê min heye, em dikarin di rê de hinek biaxivin jî. Êê tu li ku dimînî? Ji bo çi tu nehatî ba min? Ez cardin di kavila kevin a berî de me... Wisan dixuyê, tu li mala kurmamê xwe Lawe yî? Ferq nîn e. Mala wî baştir e, ez bi xirabî nabêjim, ger çendîn ew havrêtiya me jî nake lê ez gelek ji Lawe hez dikim. Va qaseke xwe daye milek, mijûlê kesp û kar e, bêguman perek wî yê baş jî heye.

Ji bo ku li hemberê gotinên wî terkexemî nezane, Camêr jê pirsî:

- Di çi de Lawe hevkarî bi we re nake?

- Di hemû tiştê de. Wek min got, wî xwe daye milek, heta êvarê mijûlê kesp û karê xwe ye û dema ku êvar jî bi ser de tê, dikeve mal û çavê kesê pê nakeve.

Camêr bi ecêbmayî jê re got:

- Piştê êvarê çavê xelkê ji bo çi pê bikeve, ma gelo bi şev ji seet heştan heta şeşê beyana sibê ge-

ran û hatin û çûn qedexe nîn e?

Aso bi ken gotê:

- Ew yeka ku tu dibêjî, ji bo xelkê bêkar wisan e, ez û çend hevalên din, me ev qedexetiya dewletê dirandiye. Me kiriye dûr û her şevê em li mala yekê berhev dibin. Em ji êvar de diçin, şeva xwe li wir derbaz dikin û li wir jî radikevin, beyana sibê piştî temambûna qedexebûnê, derdikevin derve. Bi vî awayî em dikarin di van rojên teng de jî rojên xweş ji xwe re derbaz bikin. Kuro em ê çî bikin, dinê mirin e, her dê ev ji me re bimîne.

Camêr got:

- Wisan dixuyê, kes ji we hê nezewiciye û hal û wextê we Jî baş e.

- Erê welle, ji derveyê min, tev jî zewicî ne. Ji bo halê xweş jî, em tev nemir ne jî rojên xwe dibin s.erî.

- Ê tu ji bo çî bi vî awayî reben mayî?

- Li gor qeneeta min, di welatê me de mêr bi xwe xwediyê serbestiyek nîn e, eger bizewice û ew jî hinekî din dest deyne ser serbestiya wî, wê demê dibe esîrek tam û tekûz ê rasteqînî. Bi bîra te de ye ku Salar Pîrot nû zewicîbû, nediwêra bêje zewac xerab e û ne jî dikarî bêje baş e, lê bi mercê ku jina wî li wan deran nebûya!

- Çî? jin mêran ji serbestiyê dikin... Bi Xwedê ya herî baş ew e ku te ji serbestiyê nekirine. Li gor

gotina te, ew e ku di van rojên teng û nexweş de  
jî hevalên te yê zewicî serê xwe nakin malên  
xwe?

- Ha ji bîra min çûbû ku tu layengirê jinanî, lê  
ez didim, distînim û difikirim bi rastî ez nizanim  
ji vê zêdetir îhtiyaca jinê bi çi serbestiyê heye?  
Camêr serê xwe hejand û bi hinek şewat gotê:

- Hey bextreş û beşxwarên jinan, serbestiya xwe  
xemilandin, xweşikkirin, naz û nazdariyê didinê  
ku xweştir pê re derbaz bikin. Lê çi heye dikeve  
nav hewayek wisan û wisan pozbilind dibe û mêran  
jî tê digihîne, her wekî ne tenê hemû serbestiyên  
xwe bi temamî sitendiye wek ku hevsarê

79

mêran jî kiriye destê xwe. Ewqas ew pozbilind dibin,  
em bi xwe jî ber bi şaşîtiyê de diçin û bawer  
dikin û dibêjin, me çi û ji ber çi daye wan. Ne  
kekê Aso, ne bila tirsê te û ne jî xema te hebe ji  
jinên li aliyê me, ji gelek ciyên dinê ji serbestiya  
rasteqîniyê gelek dûr in. Hingê mêr di berîkên  
xwe de xwediyê kîs û cuzdan be di hemû karan de  
dê gotina dawiyê jî ya wan be.

- Bibore bavê min, min nemaqûliyê kir, min  
nezanî ku tu bi tevayî bûyî avukatê jinan, mirov dibêje  
qey gardiyanên hepisxana te jin bûn!

- Dê ka em dev ji van gotinan berdin, li tevê  
dinê xelk mijûlê van cure gotinan in, lê hê negihîştine  
netîcek. Ya rast ew e ku naxwazin bigihîjin

netîcek! Niha tu min bi ku ve dibî?

- Ez diçim qehwexana Bextiyar, ba Nerîman Hesên.

Îro hatiye. Carên din dema ku ew dihat, li mala meta xwe dibû mêvan. Niha mêrê meta wî li ser bûyera şevê din ji bo ku hedîse li taxa wan qewimiye, hatiye girtin. Bêguman mala wan jî kirine bin çavdêriyek tund. Yê nê tîn û diçin bêxwîdan dernakeve, ne xasma yekê wekî Nerîman ê bi nav û deng ku dewlet bi çirayên hil a ronî lê digere. Vêca ji ber vê û ji ber bi nav û dengbûna wî jî ku jendirme ji nişka ve bi ser otêlan de digrin û kor, seqet û saxlem çî heye berhev dikin û dibin nezaretxanê û li wir jî li gor dilê xwe dibijêrin û davêjin bendîxanê, ji ber vê jî dibê Nerîman ne here mala meta xwe û ne jî here otêlê. Vêca kar bi tesadufî baş meşiyaye ku Kamuran Bapîr di rê de wî dibîne û wî dide agahdarkirin û dibe wê qehwexanê. Va ez jî pê de diçim û bînim mala xwe.

Camêr bi awakî bi manedar lê nêrî û got:

- Berî hemû tiştî tu wisan bi min re diaxivî her wekî ku ez do û pêr bi we re nebûme. Ji bîra te çûye ku vaye, ez deh sal in ji we dûr ketime û agahdariya min bi tu tişteke we nîn e. Gelek ew kesên tu navê wan dibêjî, ez wan her nas jî nakim.

Wek mîsal, ez nizanim Nerîman Hesên kî ye. Ji bilî vê gotinên te gelek ecêb in. Çunkî ew karê ku

80

tu pê de diçî, ne li gel areqxwerî û şevbihurkan û

ne jî li gel bîr û baweriyên te yê qasek berî gotin,  
rê nakevin. Te qasek berî niha got ku min destê  
xwe daniye ser kumê serê xwe ku ba lê nede û  
nebe, lê tu niha dikî, bidî ber bayê.

- Ne lo hema yekcarî ne wisan jî, lê ku hemû  
alîkariya me di riya tevgera netewî de hatibe ser  
alîkariyek bi vî awayî, ne bi qîmet û çend quruşek  
pere, şermezarî û namerdi ye ku em xwe ji vê  
veşêrin. Bi taybetî di demek de ku xelkên din,  
hemwelatîyên wan 1i yê me azatir û dilsoztir giyana  
xwe kirine ser lepên destê xwe û bi ser û mal  
û dîwarojên xwe û yê jin û zarokên xwe avêtine  
nav cergê xebatê. Va yê ku em dikin, erzantirîn  
fedakarî ye, ya wek ku têt gotin "bênêztirîn bawer  
e!". Te got ku tu Nerîman nas nakî, heqê te heye.  
Nerîman birayê Heme Çawşîn ê -Xwedê jê razî beku  
di xwenîşandanek berî niha de hat şehîd kirin.  
Kurekî jîr û mêrxas e di nav rêzên "L.A.N" de û ji  
rêxistinên bajêr re poste dibe û tîne. Niha tu dê  
bibînî, berî niha ew di dibistanê de bû û heta sinifa  
şeşan xwend, ji ber feqîrtiyê dev ji xwendinê  
berda û di firinek de xebitî, demek hinek serserîtî  
jî pê re hebû lê niha xebata ku dike wisan li  
wî kiriye, ji zêrê jî saxlemtir e. Kurekî têgihîştî yê  
hîşyar, bêkîbîr û saxlem jê derketiye ku li gor dilê  
te. Wî ji nêzîk de bibîne, her tenê ewqas rûne ku  
hûn hevûdu binasin û pişt re rabe here. Lê ji bo  
şevê, divê em bi hev re bin, min gelek bêriya te

kiriye. Me tevan, hemû dost û biraderan bêriya te kirine. Ez bawer im heta beyana sibê ji ber şahiya dîtina te xew naçe çavên wan. Îşev em li mala Kawe Birahîm in, mimkun e tu mala wan nezanî, wan mal guherandiye.

Camêr gotina wî bi ser de birî û gotê:

- Ya rastî, ez hez nakim bêm, ez Kawe Birahîm jî nas nakim.

- Nenaskirina te ne muhîm e, tu bi min re tê, ji bilî vê, hemû jî te nas dikin. Nee. Ez nayê tune.

Ez li bin erdê li dinya tarî li te digeriyam, niha tu

81  
li ser erdê ketî destê min. Çawan dibe, heta ez têr û tejî ji te nexwim, wisan bi hêsanî dev ji te berdim. Hevalên min hemû kurên çak û baş in û tev jî hez dikin.

- Axir!...

- Axir û oxir jê re naxwaze, seet heftê êvarê li ba deriyê duyem ê Baxê Giştî çaverêya min bike, ez ê bêm û em ê bi hev re herin mala wî. Ji wir gelek nêzîk e. Ev yeka han wiha. Dê vêca em herin ba Neriman, va li wir e, li koşê rûniştiye û çaveriyê dike.

Camêr kir ku ihh û mihh bike, Aso guh nedayê û da pêşî û çûn qehwexanê.

Dema ku Camêr ji qehwexanê derket derve ku ber bi malê here, çare û hêviyên wî ji berî ronîtir û zelaltir bûbû. Wekî bi dîtina Aso yê hevalê wî yê



zaroktîyê û wan tax û kolanan, ew gotinên nermên nazik ên germîn ku ji nivê dilê wî dirijan, ew xoşewîstî û bîrên başi yê ser xelkê derûberên xwe dibarand, di navek re wek ku jiyana wî anîbe bi bîrê. Ji ber vê, sê roj bûn, yekem car çend deqîqek behs û navê Hêwa û dayîka wî li ser perda hiş û zimanê wî wenda bibûn.

82

8

Dema ku Aso û Camêr çûn mala Kawe, Hêmin ê ku kurek xort bû, hatibû. Camêr wî bi Kawe û yê din da naskirin, herdukan gelek rêz û xweşî nîşan dan, bi taybetî Kawe. Gelek bi ser de neçû li derî xistin, berî ku Kawe here derî veke, Aso jê re got: "Bi lêdana wî ya derî dixuyê, ne yek ji me ye, ne dûr e Şaho be. Min jê re gotibû were. Gelek hez dikir Camêr bibîne, ji vê nrsetê mezintir firset jî dest nediket. Ji ber vê ez hêvîdar im hûn herdu jî tu jî kekê Camêr jî, li min biborin, Şaho kurek baş e' .

Camêr û Şaho her çendîn nasên hev ên kevin jî bûn lê çaverêya yekûdu nedikirin, lê çî heye bi awakî ecêbmayî li hev nêrîn. Şaho li gel wê ku hê di temenê sîh û pênc û sîh û şeş salê de bû, tek û tûk mûyên reş di nav pirçê serê wî de mabûn.

Wan tek û tûkan jî mûyên spî di nav xwe de wenda kiribûn û ewan jî bi rengê bizirî û bi manewiyatek jar çaverêya dîwarojên xwe yê xerab dikirin.

Simbêlek boq ê dirêj û birincî di bin pozek girovel  
û li ser lêvek sitûr de kêşayî. Ji bilî vê bi bîçima  
xwe ya girovel, têr giyan, qelew û dagirtî yê bi  
laşek nîvçe bilind ve, dijî wan mûyên spî serî hildabû.  
Bi çavên xwe yên reşên biçûk û şermokî ve,  
te digot wek çavên zarokan ji ronakî û paqijî,  
xweşî û hêvîyan bi ser de girtine. Piştî lînêrînek  
bi dax, ji Camêr re got:

83

- Erê tu Camêr ê caranî? Bêguman eger tu di rê  
de rastî min bihatiya û hemû eqlê min mêvanê  
min jî bûya, min nedikarî, ez te nas bikim. Gelo  
ew bendîxana bextşewitî çî li mirov dike?

Aso hilda got:

' - Gunehê bendîxana belengaz çî ye? Guneh  
gunehên zordaran e ku bendîxane çêdikin...

Camêr bi berkenînek xemgîn a girtî ve gotê:

- Baş e, yê min zîndan, lê wekî Aso got bi rastî jî  
zordar ez guherand im, gelo tu çima evqas serspî  
bûyî?

Şaho bi dilek vekirî û bi dengekî zelal gotê:

- Wisan dixuyê, tu hez dikî ez bêjim, ê min jî ji  
daxa dinê, yanî bendîxana mezin ez guherandim...

Na giyana min, em wek malbat, gelek bi zû, serê  
me spî dibe. Tu dibînî mamê Maruf temenê wî ji  
heştiyan derbaz dibe, tu dibêjî serê wî wek şevê  
ye.

Hemûyan bi hev re dest bi kenê kirin. Di vî navî

re Saman, Bêbak û Merwan ketin hindûr. Kawe got:

- Li gor qeneeta min qet qîmetek guherîna laş nîn e, hefteyek û du hefte mirov radibe ser piyan û pişt re dibe wek carên berî... nefesek kêşa û çavê xwe li odê gerand, ez nizan im, hevalên me ji bo çi bi derengî ketin... hemû bi ser hev çarîk seetek maye ji hatin û çûnê re?

Hêmin gotê:

- Mala wan nêzîk e, berî qedexê ew ê bigihîjin, lê tu dizanî Kawe, ez di wir de bi te re nîn im. Tu dibêjî, hefteyek û du hefte mirov radibe ser piyan û pişt re dibe wek carên berî. Ya rast ew e ku tu wext û tu caran, heta hetayê tu tiştek bi tu awayê, bi mu'cîze jî be, di ekseriyeta jiyana de jî, bi dermanê hemû milan, carên dûr dane milek mirov nagihîje seviya carên berê jî , wek şair gotiye ya do Jî:

Dikarî vegeri yara koçkirdû

Nikarî bibînîjîna rabirdû

84

Ne tu ew kesî caranî, ne yar

Ne do îro ye ne îsaljî par

Xelkê bêheq û bêsebeb negotiye: "mirov du car di eynî avê de sêbahî nake".

Kawe, piranî ji bo armanca guherandina mijara behsê, got:

- Her neyse guherîna laş qîmetek wî yê zêde

nîn e, ya girîng guherîna giyanê ye!

Saman ku kurekî qelew ê genimreng ê têrmûyê reş û dengzir bû, hilda got:

- Ev çi ye tu dibêjî Kawe, mirov dibêje tu xurifiyî.

Giyana çi laşê çi? De baş e, bila laşê te di bin daran de binale, dê ka çawan giyana te pê nizane? De ka hefteyek nan nexwe, bizane çi bi ser giyana te de tê? Heta niha di navbera giyan û laş de tu sînorek nehatiye dîtin, dema ku tu wan 1i hev cihê bikî, bi wê dereca tu dibêjî tu guherandinek tune ku bi ser laş de bê û tesîr li ser giyanê neke. Ne tenê ev, ew kar û encamên tev wan guherandinên bi ser laş de tînin, tevên wan bi hoyê mêjî ve laşê te pê agahdar dîkin, eger agahiya laş ji xwe bi xwe jî nîn e, ji bilî vê hemû ew aktîvîten îcu li ser giyanê diqewimin, menzerên mêjî û fermanên wî ne, yanî giyan ji mêjî û aktîvîten wî pê ve tiştekî din nîn e, mêjî jî endamek herî pêşdeçûyî û kemilî ya laşe.

Aso, zûde bû ku Saman nas dîkir, di dilê xwe de got:

"Wisan dixuyê, di van rojan de Saman bi xwendina diyalektîkê ve mijûl e! Pêwîst e, em hevsarê wî sist nekin û firsetê nedinê, eger na ew dê hemû kitêbê ji me re bixwîne. Ji ber vê gotê: Her neyse, ev behsek asê ye, em şeva xwe pê nekûjin, Xwedê bi xwe nexwestiye gelek bi ser vê behsê de here, ji ber vê, pêxemberê xwe re gotiye:

"Di derheqê giyanê de, pirs ji min neke, ji wan re bêje ew karê Xwedê ye"!

Bêbak bêyî ku guhê xwe bide gotinên Aso, got:

- Li gor qeneeta min, armanca Kawe li ser

85

qîmeta guherîna giyan û bêqîmetiya laş ew e ku nehêlin zor, zordarî û tadetiya dijmin dilê me biguherîne û bîr û baweriya me bileqîne. Ji bilî vê, divê sîtem û xerabiyên wan yên hovîtî, xebatên me yên di riya xistina rejîma han a genî de tund û tûjtir bikin. Bi vî awayî, em dikarin ne tenê heqê gel û welatê xwe, belkî heqên xwe yên taybetî jî ji dijmin bistînin. Wî çaxê, yanî piştî tole vekirinê em dikarin bêjin, "em nikarin vegerin ser demsalên ciwaniya xwe, lê demsalên ciwaniya me bi valatîyê de neçûn!"

Kawe ji bo karek ber bi oda jorê de çû. Camêr jî bêriya gotinên bêtirs fikir. Di dilê xwe de digot:

"Tu dibêjî pratîkên van gotinan jî pê re ne." Wî bêtirs berê xwe dayê û jê pirsî:

- Tê bi bîra te kak Camêr, yekemcar me kengî hevûdu nas kir?

Camêr, hinek melheze kir û gotê:

- Ez bawer im, çardeh-panzdeh sal berî niha li dikana Hoste Ehmedê Xeyat bû. Şahsiwar ê şagirdê wî kurek baş bû, aktîvîtek wî yê baş Jî di nav xortan de hebû. Ew bi xwe jî însanekî ewqas baş bû, nebêje...

Wî bêtirs bi ken ve gotê:

- Ne, ez bawer im, baş di bîra te de nemaye, ew cara duyem bû. Yekemcar nêzîkî salek berê wê, min û Mîran Qadirê Ciwanemerg li bajarê (....) me bi hev re dixwend. Hemû rolên îne wî bi zorî ez bi xwe re dibirim ciyê kitêb firotinan digerland. Ew bi hêviya daxistina fiyetan dima. Di destê wî de bûya dê kitêbên bazarê hemû bikiriya, kitêbhezkerê wiha bû. Rojek ji wan rojên înan tu ghiştî me. Mîran, gelek bi başî, em bi hev dan nasandin. Di bîra min de ye, destek kincên spiyên milkort li te bû, serek rût, pirçeke reş, wî çaxî. serê rût li ba xelkê gelek ecêb bû û ji ber vê bîçima te gelek baş di mêjiyê min de rûniştibû. Me behsa şîr û edebiyatê dikir, tu jî bédeng bi me re ketibû rê... Wek tu dizanî, Mîran bi xwe edîb bû. Şîrên wî yên xweşik jî hebûn lê bi giştî pesnên evîndarî û ya

86

tebîetê didan. Vêca dema ku behs hat ser şîira kurdî, tu jî beşdarî axaftinê bûyî û te rexne girt û got: "Ger çendîn jin, sipehîti û tebîet tiştên hêja yên bilindkirina bingeha bîra millî ya însanê ye, lê nabe zemîne şîrên şaîrekî mezin ê naskirî, tenê çavên belek, lêvên sor be. Pêwîst e asoya muqayese û meydana edebî ya şaîrekî rasteqînî gelek ji vê firehtir be. Divê hemû jîyan, xelk û tebîet bigre nav xwe, vêca qeyî nake zêde û kêr, çiqas û çawan". Min jî di vê warê de hemfikriya te dikir,

lê wî qebul nedikir û digot...

Di vî navî re ji nişka ve vebûna derî axaftinê bi ser de qut kir û êdî nehatin ser gotinê. Çunkî Kawe wekî mizgîniyek jê re hatibe, qêrî:

- Kuro êdî ev gotinên han bes in, kes ji me nemaye ku em li hêviyê bisekinin, cemaeta me tamam e. Rabin, em herin oda milê din, li vir ser kulanê ye, qasek şûnde em ê bikevin stiran, kilam û hezar munaqesân. Em nikarin li vir bikevin bayê xwe û dengê xwe jî bilind bikin, lê milê din kip e û Saman bi dengê bilind jî biqîje, dengê wî naçe derve.

Hemû bi hev re dest bi kenê kirin. Saman dikir ku bersîva wî bide, lê Aso bi tûndî destê xwe danî ser devan û gotê:

- Bi Xwedê, ez nahêlim gotin ji devê te derkeve, ma qey kafirstanî ranabe tu bêdeng bimînî.

Hemû di pê Kawe de çûn oda piştê ya milê din, ku di hindur de qenefeyek cihê rûniştinê ya sade, masek gilover û şeş kursiyên ji darê heyzeranê li der û dorê wê ku di nîvekê de danîbûn hebû. Di koşekî de du şuşe areq, heşt-neh qedeh, du tepsiyên biçûk leblebî, hinek fêkî û dendikên gulê berroj jî li gel surahiyek avê, li ser masê hatibû danîn. Kawe deriyê odê ya navberê girt û pencera mezin a li ser hewşê vekir û got:

- Her çendîn germ e û perwana me jî tune, lê çawan be ii kuna bendîxanê hêniktir e. Netirsîn,

min cemed jî peyda kir. Lê cemedek baş nîn e. Di bazar de ew hebû, êdî hûn bi kêfa xwe ne. Va ez ê

87

herim ji we re bînim, min gotibû ku ji me re bişûn. Vêca ji bo xwarin jî dil-cîger ji me re çêdikin lê ji bo meze nîn e, çunkî hesaba me têkel dibe. Dê fermo bila herkes qedeha xwe hilde....

Wi wisan got û yek ji wan şuşê areqê hilda, pêşî bi neynokên xwe pemboya wê jê kir û vêca bi lepê destê xwe malî û bi lêxistina binî tapa wê derxist. Xwest ji Camêr dest pê bike û qedeha wî tijî bike, bê ku li Camêr binêre, got:

- Ez ê qedeha yekem ji we re tijî bikim, ji wir şûn de herkes bi kêfa xwe ye. Dema ku li Camêr nêrî, dît ku qedeha wî tune, bi awakî ecêbmayî gotê:

- Ev çi ye, qedeha te tune?

- Ne bi Xwedê, ez her jê hez nakim...

- Çawan? tu bî û venexwî?

- Belê, piştî girtina xwe heta niha min ah kiriye ku di cejnên rizgariyê de nebe, ez nabim devê xwe.

Di destpêkê de devê tevan li hemberê vê gotinê yekirî ma, piştî hêdî hêdî ew bi ser xwe ve hatin, hinek pê ketin ku tenê firek bi wan re vexwe. Lê dîtî ku feyde nake, Kawe hinekî bi sarî got:

- Babo ku wiha be, ev nebû. Me gelek hez dikir

ku tu bi me re vexwî, lê madem tu ewqas ji bo nevexwarinê



îsrar dikî, tu bi kêfa xwe yî, em jî pê  
kêfxweş in ku çî bi kêfa te ye, tu wê bikî...

Ji wî derbaz bû, yek bi yek qedeha wan tijî kir,  
heta gihîşt ser Hêmin û jê re got:

- Tu qerdar î Hêmin, eva sê car e, tu naxwuyê,  
ji ber vê hewce ye, tu behra wan sê şevan vexwî.

Hêmin jî gelek bi hîşyarî û bi ken gotê:

- Bi serê min û te, min jî terk kiriye.

- Ez ditirsim, te jî panzdeh sal berê niha terk  
kiribe...

- Na min wisan negot, tenê heta ez bikarim, ez  
êdî areq venaxwim. Ji bilî vê, ez nevexwarina xwe  
wek kak Camêr bi mercên giran ve girê nadim.

Tenê ev heye ku va demek e, ez melheza hal û ehwalê  
xwe dikim, ez çendîn dipîvim û daytînim

88

vexwarin bi hal û rewşa min a îro û bi van demên  
aloz û nelibar re rêk nakeve.

Diyar ê ku xortekî pîst û pênc salî yê bejinkurt  
ê esmer û çavnerm ê pozpan û mamostê dibistana  
navendî bû, bi awakî tehn ji Hêmin pirsî:

- Baş e tu bi kerema xwe dikarî ji min re bêjî,  
ew karê te yê girîng çî ye ku bi vexwarinê re rê  
nakeve? Tu bombayên atom ên hîdrojenê çêdikî?

Tu di mehek de panzdeh roj bêkar î.

Yekî ji wan hilda û gotê:

- Çî peywendiya karê bi vexwarinê ve heye, her  
tişt wextek jê re heye, wek ku hatiye gotin: "Demek

ji bo Xwedê û demek jî ji bo xwe". Zêde guhê xwe nedê kekê min, ev rojên han aloz û nelibar tu dibêjî bi vexwarin nebe, dê bi çi bîn çareser kirin? Hêmin gelek bi ser xwe û bi dostane her wekî hîsa awayê tewsiyek vekirî bike. gotê:

- Ya rast ew e ku her ji wan şevên ku ez nehatime vir min bîryar daye ku êdî venexwim û ji ber jî ez nedihatim. Lê dema ku ez li ser fikirîm, min dît ku riya min riya xebatkeran nîn e. Ev rê riya tirsonektî, teniyatî û xweperestiyê ye. Çunkî carek tu hunerek tê de nîn e mirov xwe ji civakê dûr bixe û xwe jê vekêşe û bêje ez ji çirîskê natirsim. Huner ew e ku tu di nav civakê de bisekinî û tirsate ji çirîskê tune be, yanî di xweşiyê de bî û venexwî. Ya diduyan xweperesti ye ku mirov tenê li xwe be û guh nede kesên din. Ji ber vê, min xwest, ez bêm nav cergê xweşiya civata we û venexwim û her wiha xebatê jî bikim ku vexwarinê bi we bidim terkkirin. Vêca ji ber vê...

Yek ji wan ji nişka ve gotina wî birî û gotê:

- Baş e, tu carek bêje, sebebê vê dijminatî, rik û kerba te çi ye li hemberê vexwarê? Te ku heta şembiya borî bi çavên Xeyam li areqê dinêriya.

Hêmin bi awakî nerm gotê:

- Peywendiya meselê bi dijminatî û dostiya vexwarinê nîn e.

- Ê baş e, peywendî bi çi ve heye?

Hêmin bi awakî germî gotê:

- Bi me ve, bi namus, şeref û welatê me ve...

Yek ji wan bi tundî gotê:

- Ez qet tê nagihîjim, çi peywendiya vexwarinê bi van tiştên ku tu dibêjî ve heye? Em nebûne Askol ku areq vexwin û zarokên me yên biçûk pê me bikevin!

- Ha gelek baş e, ez ji we re bêjim ka gelo çi peywendiya vexwarina me bi namus, şeref û welatê me ve heye... A niha ku em rûniştine, jendirme bikevin hindûr û me tevan bidin hev û bibin û têkin zîndanê dê ar û heyayê me yê hezar salan pê biçê. Di demek wiha de xelkê me di şerê jiyana û mirinê de ye, nalîn û fîxana jin û zarokên me di destê dijmin de, hemwelatîyên me di riya rizgariya welat de û ji bo parastina ax, azadî, namus û şerefa gelê me dest ji xweşî, nîmet, kincên xweşik û xwarinên xweş berdane, em jî mijûlê areq vexwarinê bin! Vêca bi ser van tev sersariyan de, dijmin dê me li ser eniya xelkê me bike daxek pîs... û ew dê hewil bidin bi wasita me tevgera welatparêziyê kirêt bikin û ji ber çavên xelkê bêxin. Ji bo gihîştina vê armanca xwe, ne dûr e, navên mezin û bilind jî bi me ve bikin. Vêca ez bi xwe li ba xwe qet camêrî nizamim ku ji bo derbazkirina serxweşiya xwe ya demek firseta zerar û zîyanên gelek zêde bidim dijminên xwe ku navê tevgera me pê xera bikin. Eger qencî û feydek me negihîjê, bila zerar û xirabiyek

me jî negihîjê.

Qasek hemû bêdeng bûn, piştî yek ji wan hilda  
û got:

- Babo me çî daye tevgera welatparêz û  
şoreşgêr? Ew ên ku peywendiya wan bi van tiştan  
ve heye, cîh û şûna wan diyar e. \_Kes jî nîn e ku nizane  
ka em ji kîjan baskê ne! Êdî bêheq û bêsebeb,  
em xwe bi xwe diguherin.

Diyar ê ku bi van cure gotinan gelek aciz dibû û  
ji wê ditirsa ku bikeve ser zimanan û şev li wan  
heram be, bi zîrekî hilda û got:

- Babo, tiştê ji van muhakeman demakeve, kî  
90

dixwaze bila vexwe û yê naxwazin jî bila venexwin,  
qabil e, di vê de jî serbestiya me tune be!..

Fermo, dê kî vedixwe bila kerem bike. Ez bi xwe  
ji partiya vexwarinê me.

Hêmin gotê:

- Tu rast dibêjî, serbestiya vexwarina me heye û  
tu carî emperyalîzm vê serbestiya me qedexe  
nake. Heta di eksê vê, bi hemû hêzên xwe ve dikare  
biparêze. Ev yeka han nebû ku li Çînê, di riya  
parastina serbestiya vexwarina xaşxaşê re, ku wî  
çaxê ji bo qedexe kirina hemû serbestiyek rasteqînî  
ya ji bo gelê Çînê, alîkariyek mezin dida  
kevneperestên Çînê, şer daxistin! Eger ji dijmin  
bêt, ewqas vê serbestiya han bi kar tîne ku heta  
zarokên me yê ser dergûşan jî di ciyê şîr û şekir

de areq û şerab bikin nav memikên wan.

Yekî ji wan, bi dengekî hinek bilind, got:

- Wisan dixuyê, Hêmin van çend rojên ku nedihat xuyakirin dersê li dijî vexwarinê dida. De ka em şeva xwe bi vî awayî gotinan nebin serî, fermo de herkes bi kêfa xwe ye.

Diyarî serê xwe bir pêşve û got:

- Li gor qeneeta min, tesîrek mezin a sebebê aborî jî di vê biryara kek Hêmin de heye! Hêmin baş nedît ku ji vê zêdetir bi ser vê meselê de here û bêdeng ma. Vêca ji derveyî Camêr, Aso, Şaho û Hêmin şeşên din li dorê masa gilover rûniştin û ketin lîstina konkenê. Yên din jî serên xwe dan hev û ketin axaftinê. Piştî çend behsan vegeerîn ser behsa vexwarinê, Aso got:

- Gelek kes vexwarinê bi baştirîn xemrevîn û kul belavkirina dinyayê dihesibînin û dibêjin, ew mezintirîn alîkarvan e ji bo belavkirina xem, kul û barên giran a jiyana nalebar. Van gotinên han gelek tesîr li ser hişê xelkê kiriye û heta derecek wisan ku hinek kes, ji bo ew kesên hemû deriyek xweşî û seadeta dinê bi ser de hatî girtin, vexwarinê serokaniya xweşî û seadeta wî dihesibînin. Vexwarin nebûya, gelek kes bêyî ku di vê jiyandê de xweşî û şadiyê tam bikin, dê bimrana.

91

Camêr yekem car dest bi axaftinê kir û got:

- Li gor min, ew yeka ku te behs kir, pîstirîn

xirabiya giştî ya vexwarinê ye, ne başiya wî. Çunkî serxoş bi wê bêhişî û xweşiyê dixape û bi carekê xweşiya rastiyê ji bîr dike. Êdî guh nade sebebê bingehîn ê halê xerab û mal wêraniyê. Jiyana xwe ya gelek xirab û gelî, di riya jibîrkirin û nehiştina kul û derdan de berdide... Her wek ew nexweşê ji bo zanîna curê nexweşiya xwe û çarekirina wê ya rast û durust, di cihê ku ew here ba doktor, xwe bispêre dermanên bêhişî û serêşiyê yên wekî aspirînê û heta morfînê. Aşkera ye ev tiştên wisan jî ku ne tenê çareseriyek Ji derdê wî re nakin, heta firseta xerabûn û pîsbûnê jî didinê. Her wiha, ew kesên ku dixwazin çara nebûnê, derd, eziyet, feqîrî û muşkilên xwe di riya vexwarinê de bibînin, dema ku tîr ser hişî xwe, dibînin ku ne tenê derdê wan derman nebûye, serbar jî hatiye serê.

Aso piyê xwe kir nav destê xwe û bi nîv şermî pirsî:

- Baş e, gelo ji bo çî Ewropayî yê rojava bigir heta yê rojhilat ewqas vedixwin?

Camêr jê re got:

- Ez di wê baweriyê de me, ji îmkanê ye. Ji derveyê vê jî, li Ewropa rojhilat û Sovyetîstanê yek ji wan bermayên xerab a dema sermayedariyê ye... Her neyse, bi qasî ez pê dizanim, li wir jî li dij derdikevin...

92

Şaho berê xwe da Camêr û gotê:

- De ka em şeva xwe bi van gotinan derbaz nekin, tu hemû carek destê me nakevî, fermo, eger li te re zehmet nebe qasek behsa bendîtiya xwe bike.

Hemuyan bi hev re got:

- Bi rastî baş dibe, tu qasek behsa bendîxanê û girtina xwe ji me re bikî... Ne tenê ew ên ku dilîstin jî, Kawe û Bêbak destên xwe kirin bin kaxezên xwe yên ser masê û gotin:

- Bi Xwedê bes e, êdî em nalîzin, em ê guhê xwe bidin axaftina kak Camêr! Ew jî hatin, hemû bi hev re li dorê wî hatin hev. Camêr, serê xwe bir û anî, lê nêrî tu çare nîn e, divê hinek ji wan re biaxive û behsa serpêhatiyên xwe bike. Dema ku wî dît hemû bédeng çavê xwe kirine nav devê wî, got:

- Bi rastî, ez nizanim behsa çi ji we re bikim. Ya rast, ez nizanim ez ê ji ku de dest pê bikim?

Şaho gotê:

- Behsa çi beş an rewşeke jiyana xwe ya van deh salan dikî bike. Şev dirêj in û em jî jê re amade ne ... Tu behsa çi bikî ji me re wek bûyerek nû ye... Camêr cardin bê deng bû. Wisa dixuya ew li destpêkê digêriya, dawiyê Bêbak ji nişkave hilda û gotê:

- Carek berî hemû tiştê, tu ji me re wê yekê

93

bêje ku te dev ji hemû tiştê berdabû, gelo kîjan

şeytan ket bin çengê te ku tu di rojeke wiha girîng de bûyî serokê xwenîşandanek wiha?

Camêr hinek bi tundî û bi ecêbmayî ve gotê:

- Çawan, hûn Jî di wê baweriyê de ne ku ez yek Ji wan serokê xwenîşandana bi xwînî ya 25'ê Teşrînê bûm?

Wekî gerelawêjê herkesî dest pê kir, got:

- Êê çawan! Kes heye wê yekê nizane ku te serokatiya wê beşa xwenîşandanê fikir ku dixwest bavêje ser qereqola polîsan ... de, çekên wan bibin û dayirê jî bişewitîn! Kî heye behsa azayetî û qehremaniya te û yên derûdorê te seh nekiribe... Xelkê vê yekê kirin kilam û şî'ir li ser gotin!

Camêr, piştî bêdengbûna wan, bi tebessûmek melûl û xemgîn ve ji wan re got:

- Gelek mixabin! Ez gelek ditirsim beşa piraniya dîrokê jî wiha hatibe nivîsandin. Hûn bawer bi min bikin, çiqas ew kesên emperyalîzmê bi navê mezinatî û nûnerên vî welatî û gelê wî aniye holê û peywendiya van mezinan û gelê vî welatî çiqas bi wê re heye, ez jî ewqas serokê vê xwenîşandana xwînî bûm û ewqas jî peywendiya min bi wan re hebû. Guhdaran weki bawerî bi guhên xwe nekin, bi awakî ecêbmayî li hev nêrîn, Camêr jî her li ser gotina xwe meşiya û got:

- Ya rast ev e, dema ez hatim birîndar kirin, ez li ba kitêbxana giştî bûm, ne li ba qereqola polîsan. Lê wekî belav bûye, rast e ku ez pêşiya



xwenîşandanan bûm. Sebebê wê jî tenê ew bû ku ez di dawîya tevan de bûm. Bedbextî û çarereşî wisan kir ku di wê demê de ez mecburê cîbicîkirina karek gelek acîl bûm û, mecbur bûm ku ji mal derê der... Dema ez ji mal derketim der, çiqas fikra xwenîşandana partiyê di bîra miriyên Gira Seywanê de bû, ê min jî ewqas! Ji bo ku bi lez ez bikarim xwe bigihînim wê ciyê ku min fikir herimê, pêwîst bû ez ber di Deriyê Serayê re derbaz bim ku nêziktirîn rê bû. Dema min dît, ji boşahî û heşameta xelkê rê hatine birîn û îmkana jê der-94

bazbûnê nîn e, ez paşde vegeriyam da ku di riyek din re xwe bigihînim ciyê xwe. Ji ber bêmeymenetiya min, wê demê ji serbanê Serayê ve meydanê dan ber gulên şestîran û xelk bi naçarî kêşan nav kolanan û xelk ketin banzdanê. Vêca ez, ku bi wan re nebûm û di dawîya tevan de bûm, ketim pêşîya tevan. Bi vî awayê jî ez bûm serokê xwerûşandanê û yekî bi nav û deng ê serokê tevgerê! Û her ji ber wê serokatiya derew jî bû ku piştî du hefteyan bi awakî birîndar û kulek, bi 41 kesên din re em birin îdara orfî, jendirme û dilminên xwînxwar ji bo şahidiyê hatin, dema ku dfûr hat ser min, serokê îdara orfî wiha got:

- Vê birîna han û kulekiyê alîkariya edaletê kiriye, te şahidê xwe bi xwe re aniye. Ji ber vê, ev qenciya te ji bîra me naçe! Vêca ji ber vê yeka

han bû ku bê pirsîn û sual deh sal cezayê zîndanê dan min, ku di wê demê de girantirîn ceza bû ku hat dayin. Belê, çîroka pêşengî û serokatiya min ev bû... Nexo ji xwe tiştê aşkera ye ku îro ez dikarim ji bo methê xwe, bi navê qehremaniyek belaş, gotina dewletê û xelkê, ji xwe re bikim mal û ez bêjim; ez serok û pêşengê xwenîşandana bi xwînê ya 25'ê Teşrînê bûm! Lê ez tu carî vê derewa han ji xwe re rewê nabînim. Deh sal mana min a zîndanê, di valatîyê de biçê, ji min re ji vê derewê baştir e.

Piştî bêdengiyek baş ku yê konken dilîstin jî lîstika xwe xera kirin, Şaho got:

- Li gor bawerîya min, ev rastgotina te, ji serokayetiya rasteqînî ya xwenîşandana mezintir nebe, kêmtir jî nîn e!

Camêr, bê wê guhê xwe bide van gotinên Şaho yê methê, her wekî riyek helê û bersîva bîranînên xwe dîtibe ku ji nîvê dilê xwe de hîsa pêwistiya rêtina kul û derdên dilê xwe bike, bi awakî rikoyiyek dijwar ket axaftinê:

- Ew ê ku neketibe berdestê wan karbidestên dewletê, nikare bizane ew çî canewer û mirovxwir in. Niha jî gorîzî di laşê min de têt, dema bi bîra 95

min dikeve. Piştî birîndarbûna min ku cara yekem bû, min çavên xwe vekirin, ez çî bibînim! Kelaxên hemû kûştî birîndaran di hewşa Serayê de avêtibûn

ser hev. Hawar, nalîn, qêrîn, rica û dijûn  
wek xwîn, rûndik û goşt têkelî nav yekûdu bibûn.  
Ji tevan bextiyar û şad ew bûn ku yê reh ji bedena  
wan derketibûn. Vê menzera han di bin ronahiya  
çirayê kêmtîrêj a odê de, di serê min de  
menzerek ewqas bi sawm û neşêrîn çêkir, wek ez  
bikevim çonca dehlîzek tarî, bi wî awayî li min  
hat. Wextê hişê min hat serê min, min giraniyek li  
ser singa xwe hîs kir. Gava min destê xwe bi ser  
de aland, min dît ku serê mirovekî ye. Min ji  
hêdîka ve girt û xwe wegerand heta ku ez bikarim  
ji ser singa xwe bidim alîkî. Min ji ber tîr û arhana  
birînên xwe kir qêrîn û destê min ji serê mirovê  
filitî û ew wek miribe bi wî awayê şimutî û çû. Wî  
çaxî ket bîra min ku min jî tîr xwariye. Pişt re, bi  
çi hal û mercê bû. min xwe hînekî din bi paş de  
kêşand û pala xwe da dîwarê. Min hêz û taqet bir  
ber xwe, êş û arhana birînên xwe kêşa dilê xwe û  
bi saya tîrêjên ronahiya odê min karî piçek jî be ez  
serê xwe ber bi mirovê teniştê xwe de bibim û lê  
binêrim, ka gelo ew kî ye. Min dît ku xortekî taze  
simbêl xwidayî û çavên wî nîv vekirî ye. Ji germiya  
destê wî dixuya ku va qasek e rehê xwe daye.  
Hemû reh û rîşên giyana min ji hev ketin, ne hişê  
îmkana lêkolînê, ne çavtêniya nêrîn û girînê, ne di  
dest û piyan de hêza lepitandinê, ne di dil de jî  
wextê xem û kerbxwarinê di min de ma... Wekî  
tiştê ji hal û taqet bikeve û tîniya xewê bikişîne, ez

bi wî awayî bûm. Min bi xwe jî nedizanî divê ez çî bikim. Ji nişka ve wekî tîrek li birîna min bikeve, min kir hawar û qêrîn, ka gelo belkî hinek av bidin min, an min bibin nexweşxanek û qet nebe min bidin ber gulan, bikûjin û ez xelas bim. Min taqetê bir ber xwe, lê birînên min ketin tîr û arhanan. Wisa dixuya ez di wê taqetê de nebûm pêşî bi tîr û arhanê bigrim, cardin ez ji hişî xwe çûm...

Dema min çavên xwe vekirin, ez nizanim piştî  
96

çiqas wext bû, min xwe di odek biçûk a nizm de li ser karyoleke hesinî dirêjkirî dît. Lingê min ê birîndar pêçane û lingê min ê din û destê min ê rastê bi zincîreke sitûr, bi lingê karyolê ve girêdane. Roja duyem bû. Piştî ez bi ser hişî xwe ve hatim, doktorek hat oda min, çavê xwe li kaxiza ber serê min daliqandî gerand û êdî bêdeng, çawan ket hindûr bi wî awayî jî derket û çû. Rojê carek birînpêç dihat li birîna min dinêriya û derman dikir. Ser û çavên birînpêçê ewqas pirç û gorz bû, min taqet nedikir ez jê bipirsim bizanim ka gelo ez li ku me û rewşa birîna min çawan e û dê çî li min bikin? Lê roja sisiyan, ew bi xwe ket axaftinê. Pêşî ez jê tirsiyam, ku gelo yek ji wan kesan nebe, ji min gotinek derbixe. Lê pişt re min dît ku gelek bi tirs diaxive û li ber kesên din gelek bi tundî û tûj bi min re hereket dike, ez lê emîn bûm. Di saya wî de, min zanî ku hestiyê lingê

min li ber gulê neketiye û wek min jê hêvî dikir  
rûviyên min jî li ber neketibûn. Min jê re got,  
ji birîndaran ez tenê li vir im, dema min hevalên  
birîndar ên din jê pirsî, ji min re got ku yê din  
tevan birin nexweşxana eskeriyê. Ji ber ku min  
serokekî mezin dizanin, nexwestine deynin ciyekî  
din ku peywendî bi hin kesên din re deynim. Min  
jê pirsî ez li ku me, bersîva wî qudumên dest û  
piyên min şikandin... Min li dayira asayîşê ya giştî  
girtine û muayene dikin! Hûn tev pê dizanin ka çi  
sawma navê wê dayîra pîsê gemar di dilê xelkê de  
heye. Gelek kes henin ku bi awakî sipasî panzdeh-  
bîst sal hukum qebul dikin, bi şertê wan  
îşkence nekin, ew ciyê îşkenca ku dibêjin kê  
kes bi silametî û jîndarî jê derketine der ve... Li  
gel van hemû sawm û tîrsa li ser min rûniştibû jî,  
min nexwest li hemberê mirovê birînpêç xwe  
biçûk bixim. Ji ber vê, bêtirs min jê pirsî: baş e,  
madem di netîcê de her kuştine, êdî ev mesref,  
berketin, pê re mijûl bûn û başkirin ji bo çi ye?  
Bila dev ji min berdana, ez bi birînen xwe ve bimrama  
yan bikirana qurbana guleyekî din. Nexo

97

canê min ji canê şehîdên din şêrîntir nîn e. Wisan  
dixuya, dengê min ji pêwistiyê zêdetir derketibû,  
ji ber vê, rengê mirovê birînpêç bizirî û destê xwe  
danî ser devê min û got: Bes e, di riya Xwedê de  
bes e, eger ew seh bikin dê min jî têkin ba te, zarokên

min biçûk in û ez li ber îşkencê jî nadim.

Dema wî gotina xwe xelas kir, polîsek ket hindûr  
û bi awakî tundî jê re got: Ev çi ye, te hê dev jê  
bernedaye? Segbav ji min û ji te baştir e, heq ew e  
em wî bibin, ew beranê kozê nîn e û me wî ji bo  
kozê jî neaniye li vir!

Çend roj bi ser van axaftinan re derbaz bûn, rojek  
birînpêç hat û bi awakî matî di bin lêvê xwe re  
got: Xatirê te, di xweşiyê de bimîne. Belkî em êdî  
hevûdu nebînin. Min jî bi awakî ecêbmayî jê re got:  
Çawan hê birînên min baş nebûne. Hê gotina min  
xelas nebibû. du polîs ketin hindur û yek ji wan bi  
toreyîyek ne di cih de, got:

- Rabe, xwe berhev bike û bide pêşiya me!
- Xwe berhevkirina çi?
- Segbav radibe rûyê me û tê nav çavê me...

Min ji xwe bi xwe re got:

- Ez kengî li rûyê we rabûme, min çi kiriye û çi  
qebebetê min heye? Fermo, em herin!
- Bi kulekî û birîndar ez ketim pêşiya wan. Yekî ji  
wan got:

- Rast bimeşe, xwe kulek meke, bi qasekî şûn  
de em ê te hînê reqs û govendê bikin!

Ez ewqas ji rehê xwe aciz bibûm û min dixwest  
ez biçim ser wan û çi di dilê min de heye birêjim,  
lê berî ku ez devê xwe vekim û dest pê bikim,  
yekî qereseyê bilind ji oda rexê me derket û got:

- Ho Camêr ev tu yî... Dê hûn wî bi ku ve bibin?

Were, ez bizanim ka gelo mesele çî ye.

Ji hêdîka ve wî dest avêt milê min kêşa û min bir ew oda jê derket û derî pêve da, got:

- Kerem ke rûne. Tu çî vedixwî? Çay, qehwe yan ava fêkiyan? Birîna te çawan e?

Ez ecêbmayî mam ji vî karî. Min da bîra xwe û ez fikirîm, lê nehat bi bîra min ku min di xewnê 98

şevan de jî vî mirovê han dîtiye. Êê hemû ev dostî, îkram û qedir çî ye? Her wekî şaşmayin û teeccuba min a ji van pirsên wî, xwendibe, bi rûyekî xweş ve wî got:

- Bêguman tu min nas nakî, çunkî me hevûdu nedîtiye. Lê pêwîst e em mirovên wek te nas bikin. Vê siba han, min di nav wan nivîsandinên li ser masa xwe de, navê te dît ku ji bo lêkolîn û tehqîqata mesela te, dê te bînin ba me. Ji ber vê, min jî vê yekê firset zanî ji bo ku ez xwe bi te bidim nasandin û eger ez bikarim xizmetek jî ji te re bikim.

Hat bi bîra min ku wan davik li ber min vedaye, ji ber vê, dixwazin bi gotinên xweş bi min re hereket bikin. Wek dixuyê vî mirovî heta niha gotineke xerab ji min re negotiye. Ya rast eger wî jî wekî jendirman, min bidaya ber dijûn û xeberan min dê çî bikira? Her neyse, em binêrin ka di ji vê şêla wî çî derkeve. Hê ez bêdeng sekinî bûm, wî got:

- Kerem ke rûne.

Wî li zîlê xist û mirovek ket hindûr, jê re got ku du avên fêkiyan ji me re bîne û nehêle kesek din bikeve hindûr...

Xwe bi kaxeza li ber xwe ve mijûl kir û heta avên fêkiyan ji me re anîn. Cardin ji wî mirovî re gotina xwe dubare kir ku çi kesî bê balê, ji wan re bêje ku karek wî yê girîng heye. Ji ciyê xwe rabû û hat li ba min rûnişt. Bi ken, got:

- Birîna te çawan e? Şukir baş bûye. Baş bû ji hestiyar negirtibû. Her neyse, hemû bi ser hev çend rojên din, dê ew jî derbaz bibin û pişt re dê tu biçî mala xwe. Ez hêvîdar im muamelên xerab bi te re nekirine, çunkî bi rastî jendirmên me gelek ker in, bi hemû kesî re wek hev hereket dikin. Mirovên baş û xerab Ji hev cihê nakin. Her neyse, ger gilî û gazindeke te hebe, gerek e tu li mebiborî...

Mejiyê min fikir biteqe. Ev çi ye. Ev mirovê han çi dibêje, ew min kî dihesibîne? Bêguman 99

şaştîyek di navê min de heye. Lê nee, min navnîşana xwe ya temamî got, Camêr Bayîz xelkê... Ez ewqas şerpeze bibûm, min bi xwe jî nezanî ka min çawan bersîva pirsên wî dane. Lê wisan dixuya, min gotineke wisan nekiribû ku dilê wî pê bişkê. Çunkî bi rûyekî geş û xweştir ber bi min ve hat û destê xwe danî ser destê min û got:



- Ez gelek û gelek pê kêfxweş bûm ku te wê biryara zîrekane daye, ji xwe me jî, ji têgihîştin û jîriya te, vê yekê hêvî dikir...

Devê min ma vekirî û ez şaş mam, biryarê çi? Min çi biryar, li ba kî û li ku daye? Hemû laşê min di xwîdanê de mabû. Min xwe bi xwe fikirî, gelo nebe ku dema hişbirinê de ez axaftibim û yan ewan ez dabim axaftin, lê çawan? Ez tu tişteke nizanim heta ku ew gotin ji min derxirt... Wekî gêjan min dest bi kenê kir, wisan dixuya ev kena min a ne di cî de, ciyê xwe girtibû, çunkî wî got:

- Gelek nerewa û zilm e, lawekî wek te, bê heq û sebeb xwe di riya xeyaleke serxweşiyê ya wiha de feda bike. Rizgarî... rizgarî... azadî... kî rizgarî û azadiyê ji we sitendiye? Çend menfeetperest û xweperest dixwazin li ser laşê vî gelî han ê belengaz û rût bigihîjin mezintî, desthilat, waridet û nî'metan... Gelek mixabin e ku bi sedan lawên wek te bi qîmet û xwedî dîwaroja geş, tê de ji nav biçê û bi hezaran jin, zarok, pîr û kalên bêguneh tê de bîn kuştin... Ew ewqas ker in, wisa dizanin hukumet bi hêsanî bi gotina bimre û hilweşe dê kaviil be û ew bîn şûnê.

Wî gelek ev gotin kirin, ez jî wisan bibûm, çirîskêk lêbida, agir dê min bigirta. Min dixwest, ez meselê fam bikim, ez bizanim biryara guherîna min çi ye û ev hêtîmê han çi ji min dixwaze... Piştî axaftineke dûr û dirêj di derbarê hêzbûna hukumetê

de, başî û dilsoziya karbidestên wê, pûç,  
vala, nebaşî û neqenciya welatparêzan, axaitina  
xwe bi vî awayî domand:

- Niha ku min û te me ji yekûdu fam kir û te jî  
biryara xwe daye ku em, tenê ne ji bo îro, ji bo ro-  
100

jên bên jî lihevhatinek îmza bikin, tu alîkariya min  
bikî û ezjîya te...

Min serê xwe kir ber xwe û min nedizanî ka ez  
ê çi bêjim. Ew cardin ket ser gotinên xwe û bi vî  
awayî domand:

- Ew tiştên dê tu ji hakim re bêjî, niha ji min re  
bêje ku ez bikarim alîkariya te bikim. Tu, ji rojek  
û du rojan zêdetir li vir nemînî û ez te bişînim nav  
mal û zarokên te. Mehaniya te jî bidim zêdekirin û  
di nêziktirîn firsetê de hewil bidim li ba ... Beg ku  
kurmamê min e, te bike serokê dayîra te.

Gotinên wî wekî tîran li ser dil û cîgera min  
tesîr dikir, li gel vê jî, min sebir dikir û wan  
dikêşa canê xwe, ji ber vê, min xwe li nezanîne  
danî û gotê:

- Tu gotinên wekî çi kerem dikî?

Got:

- Ew ên ku te biryar daye, tu li ba hakim bêjî,  
niha ji min re bêje, wekî navê serokên wê tevgerê,  
ciyê kel û pel û çapemenî û serokaniyên peran,  
ciyê xweveşartinê, peywendiya wan bi dewletên  
biyanî û ev cure tiştên han. Wî tişteke di binê

himbana xwe de nehîşt û yê min jî ne îmkan û ne bahana sozdanê di min de ma. Ez têgihîştim ku ne tenê jiyar, dîwaroj, heya û şerefa min bi wan gotinan ve girêdayî ye ku ger ez ê niha û şûn de bikim. Ji ber vê, min tenê hewlê wê da ku xwe têkim bin perda belengazî û feqîrtiyê, bes:

- Ya rast, ez baş tê nagihîjim, tu bawer bikî, bi destpêkê, yanî ji birîndar Wrîn, girtina min û heta niha, hemû serpêhatiyên min wek sînemayê tîn ber çavên min, wek fîlmek ku min xwe tê de seyr kiribe, ne wek tiştê henek û yarî, biryara çî û sozdana çî? Ev ên han tev li ba min metelok in, bi rastî ez tê nagihîjim, ne xasma ku bikarim çara helek jê re biDînim. Ez ê memurekî biçûk a bi maaş çima serê xwe bi van cure tiştan biwestînim, min ancax destê xwe daniye ser kumê xwe ku ba nebe...

Bi tewrekî toreyî ve, hinek rengê wî zer bû, lê  
101

xwe pê ragirt û bi kenek ne ji dil, got:

- Ne birayê min, hema bi yekcarî ne ewqas jî.

Belê gotine: Xwe kêmkirin camêri ye, lê xelkê ker hesabandin jî ne jîrî ye. . .

Bi lez û tirs min got:

- Ne qurban, armanca min ne ew bû ku Xwedê neke cenabê we têngihîştî û nezan bihesibînim! Kesek heye ku navê we seh nekiribe! Kî heye nizane ku we failên çendîn qebahet û hedîsên mezin

dîtine. hûn...

y Bi awakî tund gotina min ji devê min birî û got:

- Ez fend û fêlan naxwazim, min tenê xwest ez te rizgar bikim, çunkî min dihesiband ku tenê tu ji savatî, dilpakî û nezaniya xwe têkelî van hedîsan bûyî. Gunehê min bi ciwantiya te hat ku tu bêheq û bêsebeb bi ser û mal tê de biçî. Bi taybetî ku mesele 1i rojê aşkeratir e û te bi xwe jî soz daye ku çî tiştê rastî heye tu ji karbidestan re bêjî...

- Ez gelek sipas dikim, lê hûn bawer bikin, we şaş têgihandine, min soz bi tu kesî nedaye ku heta tiştê nehênî jê re bêjim, çunkî ez qet nehênîyek nizanim...

Zabit, bi awakî toreya li ba min rabû û çû ser masa xwe, rûnişt û got:

- Xwe li bêfehmiyê daneyine, tu pêşengê wê beşa xwenîşandanê nebûyî ku êrîşê dibirin ser taxa dayira asayîşê li wir bû. Eger jendirme hişyar nebûna, gelek nemabû we tevan dikûşt, dayirê dişewitand û çekên wan jî dibir. Jendirme tev şahîd in li ser te. Ji bilî vê, di wê hengamê de gulle jî li te ketiye û di dema tedawiyê de, te gelek tişt li ba birînpêç "N..." ji devê xwe pekandiye û te soz daye ku dema tu sax bî, hemû tiştî li ba hakim bêjî. Bi ser van tevan de, me tev navê serokên we di dema lêgerînê de dest xistiye. Piraniya wan hatine girtin û îtîraf bi gunehên xwe û daxwaza lêbûrînê jî kirine û behsa navê te Camêr Bayiz jî

kadroyekî rierî aktîf ê pêşkevtî yê partiyê kirine.  
Ji bilî vê, navê te di wan belgên nivîsandî yên di  
dema lêgerînê de ketine destê me jî hene. Vêca,  
102

tu niha çî dibêjî? Yan wek mêran derdikevî holê,  
çî dizanî bêtî, heta ku ez jî raporeke baş ji bo te  
binivîsim, şev bi ser girtina te re derbaz nebe.  
Çendîn wî gotinên xwe didomand û dirêj fikir,  
baştir rastiya wê gotina pêşiyên me ku gotine:  
"Însan dema ku zêde bêje, baş jî dibêje û xerab jî",  
derdiket. Çunkî min di axaftinên wî de tiştên wisan  
derdixist ku bi tevayî bingehê gotinên wî derew  
derdixist û pûç fikir. Bi taybetî ew gotina ku  
digot, navê te di lîsta kadroyên herî aktîf ya "Partiya  
..." de ye, serokên partiyê yên hatine girtin  
behsa navê te wekî kadroyek aktîf û pêşkevtî kirine.  
Ji ber ku tu peywendiyê min bi "Partiya ..."  
re nebû û nîn e û min yek ji wan serokên wê jî  
nas nedikir. Ji ber vê, daxilê tu quwetê de nîn e  
ku navê min jî bizanin û behsa min yekî wek kadroyek  
pêşkevtî û yê herî aktîf bikin. Ji derveyê  
vê, ger lîsta navê hemû endamên partiyê,  
navnîşanên wan ên bi temamî jî dest bikeve, ne  
mimkun e ku navê min tê de be... Min dît ku zabit  
bi dîqqet li min dinêre, min bi awakî gelek hişyar  
jê re got:  
- Tiştê min a nû nîn e ku ez bêjim, agahê min  
bi tu kesî nîn e û ez tu kesî jî nas nakim...

Zabit, bê çare, destê xwe ber xwe de berda û  
got:

- Baş e, tu bi kêfa xwe yî. Tu hez dikî neaxive. Lê  
em dizanin, em ê te çawan bidin axaftin... me kerr  
û lalan kirine bulbul, nexwasma yekî wekî te, wek  
dabelanidna qurtek ava sar e!

Hingî diçû, sebir li min diçikiya û êrîş, gotin û  
lavahiyên wî yên ji bo destxistina min beyhude û  
valatîyê de diçûn. Min xîretê bir ber xwe û wek ku  
ez li ber serî hildim, min gotê:

- Belê belê! We nehêniya bomba atomî dîtiye!  
Tenê ne ew e ku hûn min bidin ber daran? Eva  
laşê min û eva jî darê we. Dema ku min ev gotin  
gotin, wî bi awakî tund li min nêrî, ez jî weîu ku  
ez ji van gotinên xwe hinekî poşmam bibim, ji ber  
vê, ji wan gotinên xwe yên berî hinekî xavtir, min  
103

gotê:

- Hûn çî dikin, bikin, min li ber daran bikûjin,  
hûn ji bilî yên ku min ji te re gotin, tiştêk ji min  
seh nakin, çunkî ez tiştêk nizanim.

Wisana dixuya wek ku gotinên min di destpêkê  
de daxek bi ser dilê wî dabe, toka xwe daqurtand  
û bi serhejînek ve got:

- Her neyse, em di vî karî de nû bin an kevin, lê  
tecrubên me yên li ser we heta niha ji me re îspat  
kiriye ku çaktirîn rê ew e ku heta niha me dijî we  
bikar aniye û vê jî baştirîn ber 1i me re daye. Kes ji

we jî heta niha ewqas merd nebûne ku hûn xwe li ber lêdan û îşkencê rabigirin ku em negihin netîcek û em dev ji we berdîn. Dê ka em ê niha hîn bibin, belkî tu yek ji wan merdan bî!  
Wî li zîla li pêşiya xwe xist, mirovê ber derî ket hindûr û jê re got:

- Ji polîsan re bêje, bila vî kurê bibin oda "23" an. Berê xwe da min û ji min re got: Webalê te li sitûyê te be, hê wexit derbaz nebûye, heta êvarê jî, çi dema ku tu ji hespê şeytanê peya bibî, tu dikarî ji polîsan re bêjî, te bînin ba min. Ez hê li ser gotina xwe me.

Min serê xwe kir ber xwe û ez bêdeng ketim pêşiyapolîsan...

104

10

Camêr, dema bi van gotinên xwe gihîşt vir, çavek li derûdora xwe gerand û got:

- Li gor min bes e, em di vir de bibrin, tu tam di çîroka min de nema. Hemûyan bi hev re gotin:

- Ne bi Xwedê, tu divê gotinên xwe ji me re tamam bikî, taze dike behsa te xweş bibe. Dê tu bi Xwedê...

Camêr, cardin ket axaftinê:

- Min di rê de melheza gotinên wî mirovî fikir.

Hinekî li min giran dihat ku tirsonekiya hinek xebatkeran, dayira asayîşê bigihîne wê baweriyê ku lêdan û îşkence baştirîn û nêziktirîn rê ye ji bo

Îtîraf kirin û aşkera kirina hinek nehêniyan. Her çendîn min dizanî, hejmara van cure kesên tirsonek, jar û xweperest jî di nav rêzên xebatkeran de gelek kêr in -gelek mixabin ku ez bi xwe nîv kesek im ji wan- lê li gel vê hejmar kêmbûnê jî, ziyaneke gelek zêde gihandine endam, tevger û azayetiya komên xelkê. Çunkî ji bilî ku nehêniyên girîng û navê xelkekî zêde aşkera kirine û cîhaza gropagandê ya dewletê jî çî ji destê wê hatiye ji o xistin û jarkirina azayetiya xelkê û nehiştina bîr û baweriyê bi tevgerê, îstîfade ji van îtîrafan kirine. Di eksê vê, tevger nekariye îstîfadek bi wî awayî ji vê bîstîne ku hejmareke zêde ji lawên xelkê yên zîrek û qehreman, bê wê ku gotinek ji

105

devê wan derkeve di bin dar û îşkencên dijmin de, bi mêranî canê xwe sipartine!! Her neyse, ger çendîn min di wê demê de zêdetir di zaviya rewşa destkevtiyên xwe ve li meselê dinêriya, lê di wî halê min de, qet cihêbûnek di navbera destkevtiyên min û yên giştî de tune bûn. Eger kar baş bimeşiya. ez jî rastê wan tesaduf û serêşiyên nedibûm. Her çendîn min melheza wê yekê jî fikir ku belahêq û sebeb, di bin dar û îşkencê de ew dê min bikûjin û guneha min bi min nedihat û min dijûnan bi rejîm, qanûn, hukûmet û heta bi tevger û partiyan jî dida. Min ji xwe bi xwe re digot, ger ev birîna han bi min ve nebûya, mimkun bû ku ez



rizgar jî bûma, lê niha tenê Xwedê dikare tişteke bi min bike. Ji tevan jî nexweştir li ba min ew bû, hay û agahê min bi tişteke tune bû... Wisa li min hati bû, min hêvî dikir û dixwest ku gotinên mêrik rast bin û ez jî tişteke bim, ji bo ku barê cezayê min li min ewqas giran nebe...

Derê odê ji min re vekirin. Yekî ji nişkave dehfek tund li min xist. Ez bi ser dev û rûyê xwe ketim nav odê û min destê xwe bi ser û çavên xwe aland, da ku ez bizanim li ku yê min şikest. Piştî ez rabûm ser piyan. Ewan deriyê odê xirp bi ser min de girtin. Di destpêkê de ez li ser piyan çik mam sekinî, çunkî di odê de tu ronahî nedihat xuyakirin. Hêdî hêdî çavên min hînê tarîtiyê bû, çend gav li pêşiya min, ji çend derzan ve tîrêjên ronahiye dihatin hindûr, ez wisa têgihîştim ku pencere ye û di milê din de bi çînko hatiye girtin. Lê ronahiya wê çend derzê, tenê têra wê yekê dikir ku mirov bikare roj û şev ji hev cihê bike. Min destê xwe aland, dîwar dît û xwe pê girt, bi lep kotan û piyan ketimê da ku bizanim mezinî û biçûkatiya odê çiqas e û çî tê de heye. Min dîwarekê tamam kir tişteke nehat pêşiya min, dema ez ji koşê vegeriyam, pê min ji tenekekê girt û wergeriya. Dengê wisan bilind û nexweş jê hat, demarên mêjiyê min rakir. Min xwest ez pêş de biçim, wisa dixuya teneke ketibû ber piyên min. Ji ber vê, ez bi ser de

wergeriyam û destê min ber terayiyek ket, min guh nedayê. Min destê xwe gerand û hewil da heta tenekê rast kir û da ber dîwarê. Cardin ez li odê ketim geranê. Ji nişka ve pê min bi tişteke din ala. Min xwest ez xwe bi dîwarê ve bigrim, lê destê min ter bû û dîwar jî hilo bû. Piyên min ji ber min çûn, min nekarî ez xwe pê bigrim, ez ketim erdê. Tişteki hişk nav çavê min ket, min bi lez destê xwe bir nav çavên xwe, terayiyek pê ve bû û min nezanî xwîn e yan ava nav tenekê ye ku bi destê min ve bû! Ewqas di ser re derbaz nebû, êşa serê min û terayiya nav ser û çavên min hatin xwarê. Ez têgihiyam ku ser-çavê min şikestiye, ez di ciyê xwe de bêhereket rûniştim. Min destê xwe yê hişk bir cêba xwe, lê tu destmal an pînek tê de tune bû. Min bi çimkên kirasê xwe nav çavên xwe zûwa kir. Bi bîra min ket ku cigara min û çaxmaxê min di cêba min de bûn, lê niha ne tê de ne, bêguman di dema lêgerînê de jê derxistine. Her neyse, min perçek dirêj ji kirasê xwe, bi diranê xwe jêkir, qet nebe ji bo sekinandina xwîna serçavê xwe pê pêça. Bi qasekî şûn de, min hîs kir ku terayî gihîşt laşê min. Dema min destê xwe aland, min zanî ku ava nav tenekê ye û ew tiştê ku pê min lê alî, helqeyek hesin e. Bêguman ji bo xelkê pê ve girê bidin bikar dianîn. Terayiyê gelek zor da min, lê ji tirsê ku ne wek ez rabim ser piyan û bikevim çalek yan rastê aloziyek bêm, bi tirs

ez ji ciyê xwe rabûm. Li vir, yekem car hat bi bîra min, ku ew teneka pê min lê aliya, teneka mîzê bû. Çunkî bîhna mîzek pîs belavî odê bibû. Dilê min ewqas serûbin bû, wext bû ez bivereşim. Kamaxên min şil bibûn, wisa dixuya ku birînên min kew girtibûn, serê min jî diêşa. Min bi qonxuşêlandî, bi ser lepan xwe gîhan dîwar û pala xwe dayê. Di navek re, ez bi halê xwe fikirîm, min ji xwe bi xwe re got: Ez xwe bigihînim derî û bidim ber gulmistan, wan naçar bikim û bîn, belkî ez ji wan re bêjim, ji min re pêxew û xwarinek bînin! Ez di lêkolîna van cure bîr û melhezan de

107

bûm, navek re ez pê hesiyam ku yekî lamba di destan de li ber serê min sekiniye û dike ku min bi pehîn û şeqaman rast bike, dibêje: "rabe, nanê xwe bixwe!"

Min jî destê xwe da li ber ronahiya lamba destan û jê pirsî:

- Nan li ku ye? ez tişteki nabînim...

Wî ronahiya lambê kir pêşiya min. Min dît ku xwarinê danîne ser amanekê. Polîs bi awakî tundî, got:

- Eva nanê te, dê bijehir e. Bi Xwedê ji we re heram e, hûn layêqê wê ne ku her wek hêstira nexweş di rê de we qurbana guleke tabancê bikin. Di destpêkê de min fikir ez daxwaza destek nivîn û çirayek jê bikim, lê dema min van gewheran

jê seh kir, min xwe bêdeng kir. Hindurê odê  
bi saya ronahiya lamba destan, bi çaralî hat xuyakirin.  
Min wek bi leza birûskê wênek odê ya ji  
çîmentoya hişk û deriyê wê ya ji textek sitor  
çêkirî, di hişê xwe de girt. Eşyayên odê tenê ew  
teneka ji bo mîzê danîbûn û bi şerbikek mil şikestî  
ya ji bo av vexwarinê danîbûn, ew bûn. Ber bi çûna  
wî re, ket bi bîra min ku mimkune hatina yek ji  
wan careke din dirêj bikişîne, ji ber vê min ne ji  
dil û wek ji devê min bifisike, gotê:

- Erê hûn pêxewek, çirayek an tiştêk din ji min  
re naynin?...

Wî bi kenek bilind a gelek nexweş ve got:

- Belê! Erê çawan, a niha em ê keçeke ciwan jî  
ji te re bînin, ji wan xwişkên ku hûn bi navê welatparêzî  
û azadîxwaziyê ve heyayê wan dibin!...

Min melheze kir ku axaftina bi van polîsan re  
wek tevdana pîsariyê ye. Ji ber wê, min xwe bêdeng  
kir û xwarina xwe kêşa ber xwe ve, wî jî lê  
xist derket der.

Min nezanî ka şîva wan çi ye, dema ku min destê  
xwe kir navê, ez pê hesiyam, nîsk an fasulye ye.

Min kevçiyek bir devê xwe, hê min tam nekiribû  
bîhna neftek wisa jê dihat, mirov gêj dikir. Ji  
hêdîka ve min kevçika xwe danî û min dest bi  
108

xwarina nanê tisî kir. Min gelek hezdikir ku bizanim  
ka çi wext e, lê seeta min ji ber tarîtiyê

nedihat dîtin. Hat bi bîra min, di vî halê han ê ku ez tê de me, korîtî çêtir e, çunkî di zîndanên wiha de, di tarîtiyê de meşîn, însanê baştir dişidîne û hereket bi mirov dide kirin. Her bi vî awayî min çavê xwe kir endamekî bêfeyde, bi alîkariya wê wêna odê ku saya ronahiya tîrêjên lamba destê polîs ku min di heşê xwe de girtibû, ez ketim pîyasekirinê. Her çiqas di destpêkê de, carek û du car ez ber dîwaran ketim, lê piştî pîvana wê bi gavan, ez ji vê astengê jî rizgar bûm... Cardin birînên min dest bi arhanê kirin, destê min jî pîs bûn û min nedewêriya destê xwe bidim birîna xwe, da ku mîkrob bigre û xerabtir be. Ji ber vê, ez di qoncekê de rûniştim. Lê şansê min hebû ku xwîna nav çavên min sekinîbû û êşa wê jî nemabû. Wisa dixuya birînek giran nebû, tenê hinek xuştirî bû... Çavên min li ser derzûkên pencera li hemberê min a girtî bû, wisa dixuya ku dem roj bû, çunkî çiqas diçû ronahî kêmtir dibû. Demek dirêj ez bi vî awayî mam. Aloziya niha û tarîtiya dîwarojê, min birin rojên borî, ew rojên borî yên ku zêdetir ez ji derdên giran dikirim. Ez di van melhezan de bûm, tirpetirp û gurmegurmek mezin ket hewşê. Deriyê oda min vekirin, du polîs ketin hindur û gotin:

- Yallah rabe, bikeve pêşiya me!

Min jî bi awakî ecêbmayî, got:

- Hûn dê min bi ku ve bibin?

Yekî ji wan bi awakî pêkenîn, got:

- Em ê te bibin sînemayê!

Ez ketim pêşiya wan. Ez pê hesiyam ku dem dema êvarê ye. Ji me pê ve kesekî din di wan hewş û avahiyan de nîn e. Min birin dehlîzeke mezin ku tenê em çar pêlpêlek tê de çûn xwarê. Yekem tiştê bi ber çavê min ket, mirovekî efendî yê cînikspî, rengzer, pozdirêj û bimade bû, li ber maseke mezin rûniştibû, polîsan silav danê û yekî ji wan gotê:

109

- Ezbenî, eva Camêr Bayiz...

Wî serhejînek ve gotê:

- Baş e, wê kursiyê jê re bînin bila rûne!

Piştî ez rûniştim, xêrhatin bi min da û bi tehin got:

- Li gor we nabe ku xebatkar silavê bi nokerê emperyalîzmê bike, ji ber vê, te silav nekir! Lê ez mirovekî hezkerê rastiyê me, ji ber vê, ev rewşa te li min nexweş nehat, lê şert ew e ku hûn di hemû tiştêkî de xebatkar bin... Bi awakî merdane qebul bikî û bêjî, we çawan vê xwepêşandana han çêkir, armanca we çibû ku we êrîş bir ser dayira polîsan û ew jendirmên bêguneh da ber gulan?... Mirovê xebatker nabe derewker be, wek jinan çavê xwe pan bike û ber bi vê çavpahkirinê de bêje: "Qurban, ez tiştêk nizamim, bi navê pêxember mîrê min, ez bêguneh im..." fermo, dê ka em bizanim, ji me re

behsa rola xwe ya xwepêşandana meha borî bike!  
Piştî van axaftinên wî mirovî, bi rastî rûyê min  
nedida ku ez bêjim, ez tişteke nîn im û haya min bi  
tişteke tune. Min şerm jî dikir derew bikim û bêjim,  
min wiha kiriye û wiha kir, nexa ez ji girtinê  
neditirsam. Ez amade bûm, çî binivîsînî ez îmza  
bikim. Ji ber vê, deng ji min derneket. Wî bi dengê  
bilind ji min re got:

- Ev çî ye, tu kerr û lal î! Xebatker nabin ewqas  
tirsonek bin. Va ye tenê tu şeş-heft seet e di oda  
23'an de yî, ziravê te teqîya û te axaftinê Jî ji bîr  
kir?

Min jî bi dengê nizm, got:

- Mesela min gelek aşkera ye, ez gotina xwe  
dibêjim û hûn jî ya xwe, ez bêdesthilat im û hûn  
xwedî desthilat. Bila gotina min nebe ya we be, cezayê  
min çî ye bidin min û bibrin... Li ser van gotinên  
min, wî dest bi qehqehayê kir, kenî û got:

- Bi rastî tu xweş dibêjî! Piştî wê xwepêşandana  
bi xwînî ya ku nezîkî sed kesan tê de hatin kuştin,  
ew agirê we berda nav welat, her bi wî awayî rehet  
û sivik we derêxin ber mehkema orfî, çend salek  
ceza bidin we û vê meselê bidin girtin? Nexêr he-  
110

val Camêr, tu bi van nêrînên xwe gelek ber bi  
şaşîtiyê de diçî. Heta tu navê hevkarên xwe, endamên  
komîta xwe, ciyê xweveşartina we, navê serokên  
xwe û serokaniya pere û jiyana we, ji mere

nebêjî, tu rehê sax ji vê dayira han nabî der. Êdî serê xwe têke ber xwe û hişê xwe berhevî ser hev bike. Rizgarî di rastîgotinê de ye, tu çî dizanî, bi awakî rast û durustî ji me re bêje û here nav mal û zarokên xwe.

Wî ev gotin kirin û cigarek da min, min jî piştî tereddutek cigara xwe sitend û vêxist, ji ber ku, pêwistiya min zêde bi zeman hebû, min melheze dikir, gelo ez çî bikim û çî bêjim. Ez bêjim min çî kiriye, gelo ez bêjim, min qenc û xweş kiriye dê dev ji min berdin? Ez bawer nakim, dûr nîn e şika wan hîn zêdetir li ser min qahîm bibe, ji ber ku navê xelkê bi min bidin gotin, hê zêdetir li min bixin... Nexêr, baştirîn tişt ew e ku ez li ser înkara xwe bimeşim, ku ew jî rierî ya rast e, êdî çî dibe bilabibe...

Dema wî dît ez bêdeng im, got:

- Qeyî nake, ez ê vê şeva han Jî muhletê bidim te, dixuyê ku tu kurekî gelek têgihiştî yî, tu gumana min di wê de nîn e ku tu dê îşev baş li ser bifikirî û beyana sibê tu dê bi xwe bê û çî dizanî ji me re bêjî...

Ya rast be, guhên min baş li gotinên wî nebûn, her çendî hemû bi ser hev çend gav em ji hev dûr nebûn û bi dengê gelek bilind jî diaxivt, çunkî dema wî diaxift, qêjîn, hawar û nalînên gelek cîgerşewitî dihatin guhên min. Li zîlê xist ku cardin min bibin ciyê min ê berê. Firset ket destê



min, min di dilê xwe de got, ji bo şevê jî be, ji bo çî îstîfade ji bawerîya vî mirovî nekim, zerara kesek jî tê de nîn e. Ji ber vê min gotê:

- Eger mimkun be, hûn emir bidin, çirayek û destek nivîn jî bidin min, ez ê gelek memnun bibim. Wî bi kenek serkevtî, got:

- Baş e, ser çavan. Kuro, hema niha çirayek baş û  
111

destek nivîn ji kak Camêr re bibin. Mirov her ji bejn û bala xwe ve dîyar e. Ev kur, kurekî baş e, tu wextî nebûye û nabe hevalê wan canewar û xwînrijan!

Dema ev gotinên han ber guhên min ketin. wek tenekek av bi serê min de bikin, ez wisa lê hatim. Destekî nivîn li gel çirayek ji min re anîn. Ez bi raxistina nivînên xwe ve mijûl bûm, sîniyek xwarin jî anîn li ber min danîn, birinc, kartol û îskanek dew jî li ber bû. Min dest bi xwarinê kir, min ji xwe bi xwe re digot: Lêxe, têr bixwe, sibê beyanê dema ku çavê beg bi te bikeve, di ciyê vê xwarinê de tu dê kutanek baş bixwî...

Şev bû, min çirayê xwe kêm kiribû, ji nişka ve derî vekirin û mirovek avêtin hindur û gotin:

- Va hevaleyê ji te re, wexta xwe bi hev re derbaz bikin...

Wan bi vî awayî got û mirovê kirin odê, qet tu pal û dehfek lênedan, lê bi ser vê de jî wek palasek ket nava odê. Min ronahiya çirayê bilind kir û ber

bi "hevalê" xwe ve çûm. Min mişe mişa wî seh kir, ji ber vê, min zanî ku nemiriye. Ket bi bîra min ku mimkun e ev casus be û ji bo fêlan anîne ba min û ji min gotinan bistîne. Dema min hê nêzik de lê nêrî, min dît ku kiras û derpêyek tenê lê ye, derpê wî bi dest xetê kitêlan lê dane û şûna daran jî bi kirasê wî ve heye. Min bi îskana dewê hinek av kir devan. Wî çavên xwe vekirin û bi hêdîka ve got:

- Tu kî yî?

Min got:

- Tu min nas nakî.

Got:

- Tu navê xwe ji min re bêje, belkî ez te nas bikim!

Ez bi xwe Bêbak Sabir im.

Min jî got:

- Ez jî Camêr Bayiz.

- Êê, tu ew kesî ku dibêjin di xwepêşandana

Teşrînê de êrîşê ser dayira polîsan kiriye.

Êê...êê...zabit got, bibin ba wî, wisan dixuyê te nû anîne vir, ew herdu polîsên ku ez anîm, te nas ne-

112

dikirin, ji yekê din pirsîn, wî behsa te ji wan re

kir... Dikir ku wergere, min bi perîşanî jê re got:

- Eziyet nede xwe, ez ê te deynim ser ciyê xwe.

- Na.. na... ez sipas dikim, halê min ne ewqas xerab e, min bi zanetî xwe xist vî halî, hegene bi derdê tazîbûnê heyayê min dibirin, min pehlewani firete wan, çendîn li min xistin, deng ji min demeket,

ew jî hingî diçûn şidtir dibûn. Hemû hestiyê laşê min şikandin, ew dixwazin ev birînên han qet baş nebin û mirov seqet bimîne...

Min jî bi awakî ecêbmayî gotê:

- Halê te ne zêde xerab e, lê bi ser vê de jî laşê te hemû xwîn e!

- Te min tazî nedîtiye, hegene dê te ji min re bigota, tu bêxwîdan derketî. Ev çi ye, nivîn û xwarinê baş dayine te, serê xwe hejand, got: Ne, ev cure pilanek wan e, anîna min li ba te jî curek din e. Yanî bi vê yekê ji mirov re dibêjin, em dikarin wekê ku hûn di otêlek de nin, xizmeta we bikin û em dikarin we di bin daran de birizînin jî, lê her curê bi we re têkelî bi xwedî qîmetek xwe ya taybetî ye, vêca hûn jî li gor dilê xwe dikarin bijêrin.

Wisa dixuyê hîn îfada te wernegirtine...

- Na, tenê du car bangî min kirin, gef û êrîşên xerab anîn ser min û sozên baş jî dan min, li gor gotina wan, sibê ew dê min bibin ji bo îfadewergirtinê.

- Her neyse, guhê xwe nede êrîş û gefan, ji kuştinê jî netirse. Çunkî îzna kuştinê ji wan re tune. Lê eger tiştek ji te dendstin, bi nêviya ku tiştekî din jî bikarin derêxin, bêperwa tînin ser mirov. Heta digihîjin dereceke wisan ku tu bi xwe êdî dizanî, çi binê himbana te de heye tu ji wan re birêjî û heyayê xwe û tevgera xwe jî pê bibî. Yan ew wext, ew bi xwe dizanin ku te bi îşkence kuştine

ku êdî ji herdu halan jî poşmam bûn, tu feydek nade. Ji ber vê, her tim li ser nizanima xwe bimeşe "nizanim rehetiya can e"!

- Vêca bi rastî jî ez tişteke nizanim.

- Ew baştir e. Baş e, qasekî wisa bêje ew dê hinek  
113

li te bixin û şûn de dev ji te berdin.

Gelek mixabin, min gotê:

- Tişteke jî li ma min tune ku ez bikarim birînên te pê pêçim. Got:

- Na kekê min, pêwist bi wê nake, nahêlin kew bigre, cardin ji bo lêdanê dibin, vêca lêxistina vê carê hîn bi eziyet e. Lê mirov divê yan vê riya han negre ber xwe, yan jî divê hemû îşkence û eziyetek bi mêranî himbêz bike...

Min nivînê xwe bi hevalê xwe yê odê re parve kir. Em demeke baş axiftin û di navek re min li seeta xwe nêrî, nêzîkî danzdehan bibû, min jê re got:

- Şev dereng e, tu jî aciz bûyî, em hinekî rakevin.

- Şev baş! Ka em bizanin sibe dê çi bi xwe bîne...

Me lêxist em raketin. Ez nizanim ka gelo ez çiqas raketibûm, bi gurmegurm û tirpetirpa salonê hat, ez hîşyar bûm. Derî ji wan re vedikirin û pişt re digirtin, hingî dihat nêzîkî me dibûn. Ez bêtirs rabûm, min fikir ku mesela van teqûreqan jê re bêjim. Lê ketin vekirina deriyê me jî, heryek ji me di ciyê xwe de sekinî. Zabitek ket nindur û sê-çar

jendirme jî di pey de, ya rast, gelek tirs ez girtim  
û ez rabûm ser piyan. Zabit bi tundî got:

- Yallah, zû eşyayên xwe bidin hev û odê vala bikin!

Wî ev yek got û berê xwe da jendirman û got:

- Van bibin milê din.

Yekî ji wan pirsî:

- Kîjan odê begê min?

Beg bi toreyî ve gotê:

- Hûn dibin kîjan odê bibin, zû ji vir dûr bixin!

Ez bi van gotinan negihîştim, tenê hişê min li ba  
wê bû ku zû betaniya xwe berhev bikim û wek  
eşyayekî xwe bidim ber milê xwe û bibim ciyê xwe  
yê nû. Wisa dixuya ferman ji wan re hatibû dan,  
ewqas girîng bû, guhê kesî li me nebû, heta ez li  
hewşa me ber wan sekinîm û min ji wan re got:

- Fermo hûn me ku ve dibin, bibin!

114

Bêçare, wî bilebîlek ji ber xwe ve kirin, min nezani  
çi got û zabit sîlek li yekî xist û gotê:

- Lez bike pîs!

Dema em gihîştin salonê, ji me wêdetir me komek  
iendirmên bi çek dîtin, li dorûberê çend kesan  
hatibûn hev. Gava çavê çend kes ji wan li  
peşmûrdetiya min û xwe kaşkirina Bêbak ket, destên  
xwe yê du du bi hev re kelepçekirî bilind  
kirin û kirin qêr:

- Bijî azadî! Bimre zordarî!

Bêbak, wek şikeft li ber nêçîrê bikeve, bi wî

awayî meşiya.

- Bijî azadî! Bimre zordarî!

Yek ji jendirman bi qondaxa tivingê li navmilê  
yekî ji wan xist, hindik mabû li ser devûrûyê wî  
têxe erdê û jê re got:

- Bixwe segbav, roja te jî dê bê!

Heta min birin ciyê min ê nû, her min melheza  
wê bûyera ecêb dikir, min çendîn dida û distend,  
ez qet tê negîhiştim. Dema polîsan derî li ser me  
girtin, bi lez min berê xwe da Bêbak û jê pirsî:

- Tu aciz riebî. Di riya Xwedê de ji min re bêje, ev  
çi mesele bû, çi qewimî bû...

Bi tebessûmek tahl ve got:

- Çavê xwe li ciyê xwe yê nû bigerîne û bi  
zîndana me ya berî re muqayese bike, mesele li ba  
te ewqas ecêb nabe. Ew ên ku ji bo oda me ya berî  
anîbûn, Pîrût, Baweys û Merwan, sê serokên qehreman  
ên partiyê bûn. Ew hovên canewer cezayê  
îdamê dane wan, niha jî ji bo îşev anîne vê zîndana  
han ku di milek de ji xelkê veşêrin û di milekî  
din de jî heta roja daliqandina wan di ciyek muhkem  
û qahîm de biparêzin... Vêca ev oda me ya  
han a pencere dar, fireh û xweş, li ser hesaba  
giyana wan a paqij destê me ketiye. Axînek kêşa û  
got: Lê qet gunehê me tê de nîn e. Hemû gunehê  
emperyalîzm û nûkerên wê ne. Her neyse, ew  
xwîna di riya azadîyê de bi destê dijminên me tîn  
rêtin, rojek dê bibin belakî bisawm, koşk û serayê

zordaran sernixum bikin, wek ku şaîrekî gotiye:

115

. Keçên me di binjilamên reş de  
Çav hilneynin bi xwîna reş de  
Kwên me hemû bi zebr û hîşyar  
Di riya azadiyê de xwe didin kuştin  
Serbilindî nabe, azadî nebe  
Azadî dibe her xwîn biha be.

Piştî hinek axaftinê em xew re çûn... Roja piştî  
wê î n bû, kesekî pirs min nekir. Beyana şembiyê  
hatin oda me, hevalê min birin û min di odê de  
tenê hiştin. Ez çend meh bi vî awayî mam û kes bi  
ser min de nehat. Rojekêji nişkave ez bi 41 kesên  
din re siwarê ereban kirim û em birin ber mehkema  
orfî û ewan jî wek min berî behs kir, bi wî  
awayî bê pirs û bê gotin hukmê xwe ya adîlane  
dan!.. Êdî piştî deh salan ez jî bi vî awayî şikestî û  
malwêran riatim nav vê agirbaranê.

Êdî şev dereng e, bes e, em Ji xwe re rakevin. Yekî  
ji wan hilda got:

- Kak Camêr, em gelek sipas dikin. Em dizanin  
ku behskirina vê girtinê ji te re çendîn gelek bi  
eziyet kolana birînek bi îşkence ye, lê tu dizanî  
çend pend û dersek 1i me re tê de heye. Me serê  
te êşand, bi rastî dihêje ew dil kolandina di wê  
riyê de bê kirin. Evê te heta niha behs kirin, tenê  
a girtina te bû, ev tenê kelîmek e li babet ew  
hemû salên zîndana te ku te ji me re behs nekiriye.

Camêr, bi awakî hêdî gotê:

- Vêca giyana min, tu dixwazî ez eziyet û nexweşiya serpêhatiya xwe ya deh salan di şevê de ji we re bêjim? Işev evqas bes e. Şeveke din ez ê behsa milek din ji we re bikim. Şev dereng e û ez jî ya rast be, demek e kesek bi destê min rteketibû ku ez evqas jê re bixivim. Ji ber vê, ez gelek pê xweş im ku lomên we bidim alîkî, lê ne ew e ku ez bêjim devê min şil bûye. Ger hûn li min biborin, bila îşev evqas bes be.

Hemûyan bi yek dengî gotin:

116

- Baş e, tu çawan dixwazî bila wisa be.

Kawe jî berî xwe da wî û Şaho, ji wan re got:

- Rabin, ez we bibim oda din hinek rakevin.

11

Beyana sibê dema Camêr ji xew rabû, lînêrî ciyê sêyem ê odê hê raxistiye, lê Şaho milê xwe daniye ser balga bilind û fişîna cigara wî ye... Rojbaşiyê bi hev dan. Camêr pirsî:

- Cemaet li ku ye, kes ji wan diyar nîn e. Tu bêjî heta kengî rûniştibin?

- Bi rastî ez jî wek te pê dizanim, ez ewqas agahdarê rabûn û rûniştinan nîn im. Ez pîranî ji bo dîtina te hatim. Bi rastî, min gelek bêriya te kiribû.

Camêr bi awakî şermokî gotê:

- Ez sipas dikim, her bijî, her xweş bî. Êdî em çî bêjin, ji vê dinyayê... Ez nizanim em çawan



biçin, xwedyê malê li ku bibînin? Qet nebe malavayiyek  
lê bikin. Li gor min a herî baş ew e, em  
wan ji xew ranekin, hêguman ew heta dereng raneketin!..

Şaho nefesek kêşa û got:

- Tu bi kêfa xwe yî, tu çawan dixwazî em wisan  
bikin.

Ew di van gotinan de bûn, keçeke dehdanzhdêh  
salî deriyê odê vekir û got:

- Hûn kerem nakin ser û çavên xwe bişon heta  
ku ez ji we re xwirîniyê bînim. An hûn hez dikin  
117

rakevin?

Camêr got:

- Belê welleh em dixwazin ser û çavên xwe  
bişon û êdî qet pêwîstî bi xwirîniyê nake.

Jina Kawe, li milî din derî sekinîbû û dihat  
xuyakirin û got:

- Çawan hûn dê bê xwirînî biçin. Kawe ji min re  
got ku ez wî hişyar bikim, vêca eger hûn musaede  
bikin ez cewab bidimê.

Camêr got:

- Ne xwişka min, pêwîst bi hîşyarkirina kek  
Kawe nake, Xwedê çi daye ji me re bînin, em ê  
bixwin û biçin. Ferq çi ye, em xwedyê malê ne.

Berê xwe da keçikê û jê re got:

- Tu jî nazdara min, çola dest-çav şuştinê nîşanî  
me bide!

Camêr û Şaho bêdeng xwirîniya xwe kirin, malavayiyê

dan jinikê ku wisan dixuya jina Kawe bû,  
derketin der.

Çend gav ji mal dûr ketin, Şaho got:

- Li gor min gunehekî mezin e, lawên vî welatî  
yê dagirkirî yê birîndar, di demeke wiha tengav  
de, ku dijmin destê xwe kiriye navê û pêwîstî bi  
dilopa dawî ya xwîn, taqet û mecala bêqîmetrîn  
herkesî rîeye, şevkariyên bi vî awayî dema xwe  
derbaz bikin!

Camêr, tenê ji bo Şaho têngihîje ku guh nedaye  
gotinên wî, jê pirsî:

- Ji bo çî, gelo kesekî ji van bi tu awayê  
alîkariyek ji tevgerê re nakin?

- Ne dûr e car û baran perek û tiştê wisan bidin  
an ji bo şevê û du şev xebatkerek bihewînin,  
ji bilî vê, ez bawer nakim tiştê bikin...

Camêr, wek ku tohmetê li ser rake, got:

- Ê wisan be gazinda te hinek tund e, qumaş bi  
bejin bala ye, ne dûr e tenê ev ji destê wan tê!  
Şaho hinek bi xeyid ve gotê:

- Nexêr, ev cure kesên han li gor hal û rewşa  
xwe di wê taqetê de ne, ku gelek ji vê jî zêdetir  
alîkariyê bidin. Ji bilî vê, nalebariya kar û hovîtiya

118

dijmin û giraniya erkê şoreş ku dixê ser milê  
hemû lawekî dilsozê vî welatî, gelek e ji vê zêdetir  
îmkanên xwe di riya xebata rizgariyê de bi kar  
bînin. Wek tu bi xwe jî dizanî, îmkana însanê eger

bi başî, bi dil, rêk û pêk bêt bikaranîn, îmkaneke  
bêsînor û bêbinî ye...

Camêr, ji hêdîka ve gotê:

- Her neyse, li gor baweriya min rewayê heq nîn  
e bi vî çavî tûj û ev hesabên zirav li gel van cure  
kesan bê kirin. Her wek ku dixuyê, bi başî hîsa  
erk û fermana niştimanî û neteweyî ya ser milê  
xwe nakin. Di eksê vê, pêwîst e li ser hîşyaran di  
ciyê lomekirin û tahlêdanan de, dilê wan vekirin  
û wek zarokan bi wan re rabin û rûnin, wan perwerde  
bikin, heta ku ew hîsên wan rast bibin û  
bigihîjin cihê xwe yê pêwîstiyê. Dema karekerek  
di wan de cih bû, mirov dikare, ne tenê hesabên  
mezin li gel wan bike, dikare mezintirîn fermanan  
jî bispêre wan. Çunkî li gor qeneeta min, dereca  
fedakarî û xwe feda kirinê ne lêhatîna qatek kinc  
a li bedenê ye û ne jî ya hebûna hal û malê ye... Ji  
ber vê, mirov ji wê ditirse ku di rûyê bê riîsîtiyê  
ve, li gel wan kirinên hov û zordariyên dijmin, ev  
hemû tehn û lomên dostayetî jî têrê neke. Hinek  
wan bikin tengiyê û bişidînin dê bêjin: Em kerê vî  
barê nîn in. Dê tif li xwe bikin û herin! Ji bilî vê, li  
gora min, nabe mirov bi çavê xwe li xelkê binêre û  
qet hesabek ji bo îmkan, jidesthatin, rewşa wan a  
taybetî û giştî neke. Mimkun e, hinek ji van bi tevayî  
hîs bi pêwîstiya ser milên xwe bikin, lê ji ber  
hinek sebebên nekarin, wekî yekek din bi ser û  
malên xwe ve bi tevayî xwe bavêjin geroka vê xebata

han a xwînavî. Bi van gotinan armanca min ew nîn e ku bi awakî pakane kesên rizî û nebaş, paqij bikim. Lê li ba min wisan e, divê berî hukumdayina li ser kesekî, em tenê li dilê xwe û bîrûbaweriyên xwe nenêrin. Divê di barê serênca wî ve jî em temaşe bikin. Û ger em bixwazin, ji bo başkirina wî hewlek bidin, dibê wê barê serênca wî jî em bigrin ber çav... Ji bilî vê, Kurdan di xe-  
119

rabtirîn tecrubên xwe de gotine :

"Mirov mûyek jî ji berazê bikêşe, baş e!"...

Dema Camêr gotinên xwe tamam kir, baş têgihîşt ku bi van gotinan parêzgeriya xwe dike, ne yê Kawe û yê din...

Bi qaseki şûn de Şaho gotê:

- Tenê di wê de ez bi te re nîn im ku tu dibêjî, mirov mûyek jî ji berazê bikêşe, baş e. Rast e, baş e, lê em wan beraz nahesibînin, eger me wan beraz zanîbûya, sed caran pêşiyên jî bigota, me wî mûyî wan ê pîs jî nedixwest. Em wan yek ji xwe dizanin û em wan ji xwe cihê nakin, an qet nebe heta niha me wan ji xwe cihê nekirine. Ji ber vê, hewce ye ewqas mû bidin me, ku em bikarin dijmin pê bixeniqînin. Ji bilî vê, ez bi tev gotinên te re me.

Bi qasekî şûn de, tenê ji bo guhertina mijarê Camêr jê pirsî:

- Erê bi rastî, min qet ji te nepirsî, tu niha çî

dikî û çawan dijî?

Şaho nefesek kêşa û got:

- Tu bi xwe dizanî, di wextê xwe de ji ber feqîrtiyê min dev ji xwendinê berda û ez bi bavê xwe re bi maltî çûm bajarê "M". Piştî demek, em rastî mirovekî baş hatin, babê min li ba xwe û min jî li kompanya "C" de bicî kir. Bi vî awayî rewşa me hinek baş bû, heta pêrar, babê min hûn xweş bin. Min jî bi naçarî mil da ber xwedîkirina bira û xwişkên xwe. Par, karkerên kompanyayê biryar dan ku ji bo wergirtina hinek heqên zehmetiyên xwe, bikevin grevê. Lê di ciyê ku heqê xwe bistînin, hinekan girtin û hejmareke zêde ji wan jî ji kar avêtin. Ez jî berketim. Vêca min jî bi naçarî bajarê "M" bi cih hişt û ez hatim li vir bi cih bûm. Niha mala bapîrê min odek û eywanek dane me û me tê de disitirin, bi wan du quruşên me berhevkirî ve dijîn, lê jîyanek nemir, nejî û ez qet çirîskek ronahiyê jî li ber xwe nabînim. Di vir de gihîştin serê duriyanê ku diviya ew cihê bibin. Camêr serê xwe hejand û gotê:

120

- Xwedê alîkariya te bike!..

- Xwedê alîkarî nake heta ku tu alîkarî nekî.

Gelo tu pê nexweş nabî, ez heta ba mala Lawe bi te re bêm?

- Na. Di eksê wê de ez gelek û gelek pê kêfxweş dibim. Lê tu hez dikî, em di kuçan re biçin,

hem riya me dûr dibe û hem jî kêmtir kes me dibînin.

- Baş e, kêfa te ye.

Bi qasekî ew bêdeng meşiyar. Camêr, li ser daxwaza Şaho yê pê re hatinê, difikiriya. Bêguman hatina wî heta mala Lawe pê re, ne tenê ji ber sebebê dîtina wî bû. Lê gelo ji bo çî li balê hat û çî Jê dixwaze? Carek nabe ewqas gêj be, da ku daxwaza alîkariyê jê bike!

Wek Şaho bi fikirkirin û melhezên Camêr bihese, xwe nêzîkî wî kir û ji nişka ve, ku wek awayek bê cî kolanê nîşan bide, jê pirsî:

- Baş e, kek Camêr, va te berdan û tu hatî nav me, niyet û armanca te çî ye, tu dê çî bikî?

Camêr wek bixwaze ji bersîvdanê xelas be, gotê:

- Carek tu bi xwe va ye, salek e hatî vir û tu nizanî ka tu dê çî bikî, vêca ez ku va ye hemû bi ser hev hefteyek nabe hatime berdan, gelo ez çî zû gihîştim biryarek?

Şaho gotê:

- Gotina te gelek di cîh de ye, lê min biryar daye, ka ez ê çî bikim. Dengê xwe hinek nizmtir kir, gotê: Min biryar daye têkelî şoreşê bim û qedera xwe bi qedera xelkê xwe ve girê bidim.

Camêr piştî demeke baş, gotê:

- Ez hêvîdar im tu bi ser kevî.

Şaho bi neçarî gotê:

- Ez sipas dikim, lê eger ez bi ser nekevim, ez

jî wekî wan hezaran kesê din. Her çendîn, bi tu awayî şika min dê wê de nîn e, ku di dawiyê de em ê her bi ser kevin!

Qasekî din bêdeng bûn, Camêr di dilê xwe de poşmam bû, ku rê da Şaho heta li mala Lawe pê re bê. Dibû jê re bigota karekî wî yê taybetî heye, jê  
121

cihê bûya. Çi dozek min bi vî awayî gotin û behsan heye. Ji nişka ve Şaho gotê:

- Ya min wiha kekê min. Armanca te çi ye?

Camêr, piştî demekê, bi awakî dudilî gotê:

- Ez... Min hê tu biryarek nedaye. Carek ka ez bizanim...

- Nabe, çawan? Qeyî nake te biryarek temamî nedabe, lê te tişteke di mejiyê xwe de cî kiriye. Tu bêjî, te di van deh salên dirêj de, qet fikra dîwaroja xwe nekiriye? Tê gotin, rojên zîndanê bi hêviya dîwarojan mirov dibe serî, bi taybetî sala dawiyê, mirov berî derketina xwe bi planên van rojan ve mijûl dibe.

Ber bi axaftina Şaho re, çend car ket bi bîra Camêr, jê re bêje: De bibire, bavê min bibire!.. Rûyê wî negirt, çi heye bi axaftinê gihîştin ciyê xwe, di ciyê wê de jê re got:

- Rast e, rast e, gotina te ye...

Êê... madem wiha ye, armanca te çi ye kekê min?

- Armanca min ew e, ez hewil bidim pariyekî

nan dest bêxim, bi jin û kurê xwe ve di qoncikek de em serê xwe bidin hev, destê xwe deynim ser kumê xwe ku ba nebe, bi xizmeta wan re mijûl bim. Min daxên mezin li ser dilê wan daye, ji ber vê. ez dixwazim wan ji vê derdê xelas bikim, jiyana min ya mayî, di riya bextiyarî û xweşiya wan de feda bikim.

Şaho, her çendîn di destpêkî jî de xwe dana milek Camêr ji bersîvdana rastî, hinek tişt kiribûn ber dilan, lê vê yekê mutewazîti û kêmaxaftin hesabandibû. Ji ber vê, dema wî van gotinên pûç û vala jê re kir, wek tu gullek berdî serî wisan bû. Çunkî bi tu awayî ev gotinên wî yên dawiyê, li gel wan gotinên wî yên berî, yên dilsozî û jîrane li hev nedihatîn. Piştî demek xwe ji xem rizgar kirinê, serê xwe hejand, berê xwe zivirand û çavên xwe kirin riya pêşiya xwe.

Camêr jî, piranî wekî wî xwe ji neraziyek xelas bike, hinek bi toreyî û tûj, gotê:

122

- Çi ye, wisan dixuyê gotinên min bi dilê te nîn in? Madem wisan e, ez çi bikim? Bêje, ez bizanim çi tişteki din ji destê min tê?

Şaho, ji hêdîka ve pirsî:

Carek tu ji min re bêje, ew gotinên te gotin, daxwazên te ne, yan biryar?

Camêr piştî demek kurt, bi awakî şeperzetî gotê:



- Çima? Ferq çi ye? Tev ev in. Daxwazên min, hêviyên min, biryarên min, armancên min, hemû tiştên min ev in!

Şaho bêtirs gotê:

- Ecêb e! Çawan tu niha, piştî deh sal hepis, eziyet û perîşaniya bêguneh, te biryar daye tu vegeerî nav mal û zarokên xwe? Wek têt gotin: Ne ba ye ne baran! Bi rastî, dilek te yê ecêb heye! Camêr piştî demek bêdengiyeke bixem, ku herî zêde nîşana hêz û daxwazên têkel. aloz û cihê yê di dilê wî de bûn, aşkera kifş bû ku ji hal ketiye, gotê:\_

- Eê çara min çi ye? Ez wiha nekim, ez ê'çi bikim? Li gor mln ev riya han a herî baş û rast e ji bo dîwarojên min. Tu çarek min nîn e û ji vê pê ve jî tu ronahiyek li ber min nayê xuyakirin. Serê min tê de çûye, agahê min bi tişteki nemaye. Hetta ez kesek û kûsek jî nas nakim. Dinya hemû guheriye. Ez wek Eshabil Kehfan lê hatime... Baş e, ger ez wiha nekim, ez ê çi bikim? Ev gotinên Camêr ku zêdetir hezîn û aşîta biryarên wî nîşan dida, hêviyan di dilê Şaho de da jîyandin û bi rûyekî geş ve gotê:

- Carek tu dev ji wan ber de, ez ji te re bêjim ka dê tu çi bikî, çi nekî. Berî riemû tiştî, ka em bala xwe bidin ew riya li gora te, riya herî baş, rast û hêsan e ji bo destpêkirina jîyana te ya nû. Dê ka em bizanin gelo wek tu dibêjî wisan e? Yan a herî

rast eksê gotinên te ne? Da vê ca, em ji serî dest  
pê bikin, ka gelo ew pariya nan dê li ku bi destê  
te bikeve? Yekî wek te, daxa deh sal zîndana sîyasî  
di nav çavan de be, tamaya wî çi bi pariyekî nan e?  
123

Kî kar jê re dide? Kîjan xwedî kar amade ye, ciyê  
karê xwe, herdem têxe bin çavdêriya polîsê sîyasî,  
ji bo çavên belek ên mal û zarokên kek Camêr? Ev  
ên han tev di demek wisan de ye, ku kesek xwedî  
kar tune. Ji ber sebebê vî şerî han karê wî kê  
nebûye. Rastê tengî û buhrana aborî nehatiye. Her  
mehê hejmarek ji karkerên xwe yên kevin kê  
nake, bi firset û bahanek digere, xwe ji yên li balê  
jî ne, rizgar bike. Deriyê karkeha xwe pê ve bide û  
ew sermaye wî ya mayî jî li xwe mesref bike. Ji bilî  
wê ku eger hukumet bi xwe deriyê kargehan nede  
ser, ji bo grev û alîkariya bi şoreşgêran re wan negrin  
û tenekin kampên girtiyan. Belê, ev e pariyekî  
nan. Jixwe, ew qoncika ku tu dibêjî ez ê serê  
xwe têkimê, ka gelo di seranserî welat de qonceke  
wisn ma ye ku mirov bikare xwe tê de biparêze,  
hey malwêran? Pişt re, di qoncikek de  
serîdana hev çi ye? Eger armanca te ew be ku xwe  
ji polîsên sîyasî veşêrî, ev li pey kumê babirî ketine!  
Çi bajêr û kîjan qoncikê tu di tê de xwe  
veşêrî, li ba wan wek ku tu di bendîxanê de bî wisn  
e. Niha Jî eger van çend rojan tu dibêjî dev ji  
te berdane û guhên xwe nadin te, ew dixwazin te,

dost û nasên te hêmin bikin û tirs Ji ser wan rabe,  
ji bo ku firset bibînin çend nêçîrek baş Ji xwe re  
bikin. Eger ji ber vê nebûya, niha wekî siyê di pey  
te de bûn.

Camêr, piştî guhlêbûna van gotinên Şaho, wek  
gêj û mat be, got:

- Ez têngihîjim, polîsê siyasî dê çi ji min bixwaze?

Em fetil bidin xwe belkî di pey me de bin.

Dema ku ez tiştekek nekim, têkelî tiştekek nebim, destê  
xwe deynim ser kumê xwe, ew dê çi ji min  
bixwazin?

Camêr gotê: Em di kolanê de herin heta ku gotinên  
me xelas bibin.

Bi qasekî şûn de, Şaho gotê:

- Li gora min, tu bi xwe, xwe têxî nav astengan,  
dema tu dibêjî, her çawan û bi çi awayî be destê  
xwe deynîm ser kumê xwe û wî bigrî. Lê tu nikarî  
124

êdî ewqas wek berî bi tundî dest deynî ser kumê  
xwe yê kevnê sivik ê niha. Wek te bi xwe jî dît,  
çawan xwe dana ber koşe-giran, xwe ji xelkê  
dûrxistin, xwe berdana ser qumar û areq, ku xelk  
wekî nimûne li wan dinêrin, bi kêrê tiştekekî nayên.

Bi neheqî û bêguneh te deh sal navêtin kûna  
zîndanê. Wê demê ewan hê navnîşana te jî nedizanîn.

Niha piştî ew te yek ji wan serokê

xwenîşandana xwînavî ya 25'ê Teşrînê dizanin, tu  
çawan dikarî bêdeng bisekinî û xwe bêserêşî bidî

koncek? Ew yek nebû ku ji bo wê deh sal hukum dan te? Eva han jî bi bîra te neçe, ew dema ku ceza dan te, guh nedan bi tund kum bi serê xwe de girtinê. Dijmin her wext qerewîlê kês û ferasetan e. Emperyalîzm nû ji şer derketiye û wisan dizane dê gûr û mî bi hev re bijîn. Tevgera welatparêz, reyina san, çend bûyerên fitne û fesadî û êrîşa çend zarokan dizane. Li gor wê, wisan bû ku ew dê çend hestîyan bavêje ber devê hinekan û bi hinekên din wî bi darê bide maliştin. Tevger dê tar û mar bibe û êdî dinya jê re bibe mastê meyî. Lê niha, çawan li seranserê welat agirê şoreşê vêketiye. Ji herçar aliyan de bi ser de gulle dibarin. Li hemû ciyek ber piyan diheze, wekî seyê har ê çar çav lê hatiye û siya wê bi xwe jê re bûye dijmin. Niha ev gotinên te xeyalên xam in û xewna serxweşan e! Bi şeqan ew dê destê te ser kumê te bidin alîkî, ne wek ku dê bidin ber gurebayê, dê bavêjin nav pêt û xuriya agirê şoreşê. Ne tenê kumê te, bi wî serê ku ew kum li ser e Jî! Şaho bîhnek da, ji bo ku karê berdewama axaftina xwe bike, bala xwe da Camêr. Dît ku bi awakî dil û can guhê xwe dide gotinên wî. Vê yekê, musulmanên pak û sade bi bîr anî, ku çawan dema mela behsa nexweşiya 'ezaba gorê, germaya pêt û agirê cehennemê ji wan re dike. ew gunên xwe ber şûr dikin. Ji ber vê, zanî tîra wî li ciyê xwe ketiye, bi lez êrîşên xwe berdewam kir û got:

- Vêca ji ber vê, li gor min dûr nîn e ev xewna  
te ya xweş, ji hezar kesan yek bikare bîne cîh. Lê

125

di demeke wiha agirbaran, buhran û aloz di welatekî  
wekî yê me de, ku bûye du beş û bi tevayî ji  
hev cihê ye. Du beşên bi xwîna serê hev tîhn in.  
Beşek gruba dijminên welat in ku ji hêzên emperyalîzmê  
bi xwe, kevneperestên xayîn û nokerên  
welatfiroş pêk hatine. Yên din jî, eniya tevgera  
azadkirina niştimanî ye. Di vê rojê de, di welatê  
me de, xwe dana koşekî û kum bi serê xwe de girtin,  
ne cîh û ne jî wextê behskirina wê ye. Ji bilî  
vê, yek ji van guruban ji mirov dev bernadin, mirov  
bi vî awayî rehet bimîne. Heta nahêlin mirov bibe  
"birayê herdu cejnan" jî. Mirov dixin di navbera du  
şivan de, ger tu wan bigrî ji bo ku navê te li ba  
wan pîs e û destê xwe têkelî nav destê te nakin û  
bi van kirinan ve jî tu dijmin xurt dikî û bi wan re  
jî nabî yar. Ji ber vê, di netîcê de tu çara te  
namîne, divê tu milek bigrî. Ew milî pêwîst e ku  
yekî wek te bigre, ewqas aşkera, diyar û ronî ye,  
dûrê te, eksê vê, navê wê tenê kerîtî û bêhişi ye.  
Camêr bi dengê melûlî jê re got:

- Belê belê, piraniya gotinên te di cîh de ne. Lê  
halê min xerab e, ez nizanim çî bi jin û zarokên  
min hatine? Ez nizanim ez ê çî bi wan bikim? Ez  
gelek bêkes û bêçare me. Wan ji rûyê min gelek  
eziyet û cefa xwarine. Ewqas heqê wan li ser min

heye ku qet nebe ez wan duçarê derd û kulên han nekim!

Şaho wekî tişteki şîn û matem wî bigre, piştî demekê, bi dengekî gelek dilovanî û hêdîka ve, got:

- Kekê min! Jin û zarokên te jî wekî yên hemû vî xelkî han, ku piraniya wan bi salan e di destê birçîtî, nexweşî û tunebûnê de dinalin, bê wê ku tişteki jî li dijî dijmin kiribin, lê cardin ew duçarê van derdan bûne.

Ew gelek nêzîkî mala Lawe bibûn, Camêr hez nedikir bi hev re biçin ber derî, ji ber vê sekinî. Şaho gotinên xwe domand.

- Vêca ku rewş ev be, yên eziyet û cefayê dixwin, malên wan wêran dibin, zarok, kes û kûsên

126  
xwe tîn kuştin û mal, waridat û karên wan di riya vê xebatê de telef dibin, van tevan di riya rizgarî, serbilindî û xweşiya welat û gel de dikin, ew fedakariyên han di riya azadkirin û şadkirina mal û zarokên tevan de ye, di riya sitendina heqên me yên xarî û welatê me yê dagirkirî de ye. Ji ber vê, divê em îftîxar bikin ji wê eziyet, cefa, derd, kuştin û girtinan ku em tûş dibin.

Şaho, nefesek sitend, ser û çavên xwe yên zer hilda û tûj li Camêr nêrî, bi berkeneke xweş ve gotê:

- Ha... tu melheza çi dikî?

- Melheze? Li xwe, li te, li gel, li welat, li zarokên xwe û li zarokên xelkê... Ez nizamim, ez tînahîjim, serê min gêj bûye. Her neyse, dema me ya bi hev re û axaftinên me xweş û bi feyde bûn. Xwedê li gel te be, ez hêvîdar im em zû bi zû yekûdu bibînin.

Şaho, di rê de ji xwe bi xwe re digot: Dema yekî ber bi qazanc û zerarên xwe re, melheza ya xelkê jî kir, ev ji bo peydakirina riyek rast a ji bo bi hev ve girêdan û meşandina destkevtiyên xwe û yê xelkê, prosesek mezin e. Madem wiha ye, Camêr rast dibêje. Dema me ya bi hev re û axaftinên me, bi feyde û xweş bûn û dibê em zû bi zû yekûdu bibînin.

127

12

Serê sibê beyanekê, piştî taştê, Camêr Ji Lawe re got, dixwaze here serî li hinek xizm, pismam û nasên xwe bide. Lê dema navê wan got, derket ku hinek ji wan mirine û gelek ji wan jî malên wan di ciyê wan ên berî de nîn in. Camêr gotê:

- Bi vî awayî be ez panzdeh rojan wan seredûr nakim!... Ev çi ye, mirov dibêje kes bi ser we de nayê naçe?

Lawe gotê:

- Nexêr, tîna û diçin. Lê ne ewqas. Xizmê malxezoranên min zêdetir tîna û diçin. Bi ser pismamên bavê min de Jî cejn heta cejnan, an dema ku dawet,

şahî û şînek hebe em tîn û diçin.

Camêr, bi tebesumek sar ve gotê:

- Ne babo, ez hêviya çaveriyek bi wî awayî ji tu kesî nakim, ez ê bi xwe biçim ba wan. Bêguman, haya wan jê tune ku min berdane, hegene ew ê bihatanabamin.

Wî ev yek got û lêxist derket derve. Destpêkê çû mala Nesrîna keça xaltiya xwe. Nesrîn, bi girîn ew himbêz kir û milê wî maçî kir. Ewî jî bi renek sorbûyî û bi şermokî xwe ji nav destan derxist. Ha).  
û ehwalê zarok û mêrê wê jê pirsî. Nesrîn bi awakî serbilind jê re got: ku herdu kurên wê di eskeriya azadkerên welat de ne, mêrê wê jî va ye sal û nîv e  
128

hatiye girtin. Dibêjin, heta kurên te venegerin, em wî bemadin. Niha ez û keça xwe ya heft salî bi kincşûştin û nanpêjî xwe bi rê ve dibin. Mala birayê wê jî ku niha li bajarê "K..." dixebite, car û baran seriyek lê bidin baş e.

Ji wir derket çû mala kurê xalê xwe. Mêrê malê li mal nebû. Jina wî û du zarokên pênc-şeş salî li wir bûn. Xaniyê xwe nû raxistî kisil kiribûn. Têr û tejitî ji zarok û jina wî dibarî. Piştî hal û ehwal pirsînê, pirsî mêrê wê jê kir, li ku ye û çi dike.

Jinikê bi awakî pozbilindî jê re got:

- Memur e, li dayirê ye...!

Camêr bi matmayî jê pirsî:

- Memur e?

Jinikê bi awakî req û bi deng, gotê:



- Belê memur e! Çi tê de heye! Ew ên ku bûn memur, çi yê wan ji wî zêdetir e? Erê welle, di saya Xwedê û hukumetê de, midurê bankê ye jî...

Camêr ku gelek ji awayê axaftina jinikê aciz bûbû, bi awakî bîzê wî lihevketî, gotê:

- Midurê bankê? Ecêb e! Mecîdê kurxalê min xwendina destpêkî neqedandibû, çawan midurê bankê ye?

Jinikê bi tehn ve gotê:

- Bi Xwedê tu xizmekî baş î! Va biyanîyan jê re rewa dîtiye, tu jê re rewa nabînî. Ji bo çi tu li hemberê me wiha yî kek Camêr?

- Mesele rewa dîtin û nedîtin nîn e, xwişka min! Ez melheza wê dikim, gelo ji bo çi biyaniyan ev cîh jê re rewa dîtine?

Bi vî awayî got û bi toreyî derket derve. Ji xwe bi xwe re digot: bêguman destê xwe kiriye nav destê dijamin, ji ber vê, wiha bilind kirine. Lê çi heqê min li ser wan heye, ez ji ber çi bi vî awayî bi şik bûm? Muinkun e pozbilindiya jinika bêrû wiha li min kir. Bi rastî ew çi bû, te digot tiyatroyê... Min xwe gelek zêde têkelî karê nav mala wan kir. Te digot ez ji bo şerê çûme, ne ji bo serîtedanê. Ne dûr e para belengazî û perîşaniya Nesrîna keçmama min di vê torebûn û şerfirota min de

129  
hebe. Gelek ne xweş e, milek li ser riya heqiyê, tûşî bi vî awayî perîşaniyê bibe û milekî din jî li

ser riya neheqiyê, deriyê xêr û bêrê heta serpişt jê re vebe! Di van bîr û melhezan de, baş agahê wî li dorûberê wî nemabû. Navek re mirovek qelew ê dirêj hat pêşî, baş berê xwe dayê, heta ku ser û çavên wî nas bike. Piştî bi awakî xweşî gotê:

- Ev tu yî kek Camêr? Tu bi xêr û di nav şahiyê de vegeyayî. Tu kengî hatî? Ez çî bêjim, roj ne ew roj in, mirov ji bo bêagahdariya hatinê, gazind ji dost û hevalên xwe bike... Êê tu çawan î? Tu li ku bûyî? Ez gelek bi dîtina te kêfxweş bûm.

Pêwîstiya Camêr bi zêde melhezê tune bû, ku xwediyê gotinên xwe yê wêk gulê tivingan, Osmanê kevne cîranê mala xalê xwe nas neke. Ji bilî vê, wan heta sinifa şeşan a dibistana destpêkî jî bi hev re xwendibûn.

Piştî qasekî axaftinên beredayî, Osman cardin jê pirsî:

- Tu li ku bûyî?

Camêr serê xwe hejand û piştî demek kurt gotê:

- Min xwest, ez serî li mala Mecîdê pismamê xwe bidim, lê... bi Xwedê ez nizanim ez î çî bêjim, xwezî ez neçûma!

Osman, bi tebesûmeke manadar, li Camêr nêrî û tiştêk negot. Camêr gotinên xwe domand:

- Ecêb e! Jina wî dibêje, Mecîd niha midurê bankê ye. Ez têngihîjim, di demê de ku malek nîn e yek jê nehatibe girtin an kuştin û yan jî baz

nedabe, nexwendewarekî wekî pismamê min  
Mecîd, çawan dibe midurê bankê? Bêşik casusiyê  
ji wan re dike. Yanî çi? Tenê dibê wiha be.

Osman, ku hê siya tebesuma bi mana li ser lêvan  
mabû, serê xwe hejand û cardin qet neaxift. Camêr  
bi awakî ecêbmayî gotê:

- Ev çi ye, xêr e, tu qet naaxivî? Mirov dibêje,  
devê te ber davikê ketiye. Çi ye, di bedelê casusiyê  
de nekirine midurê bankê... ha?

Osman gelek bi hêdîka ve gotê:

130

-Na!

- Ê baş e ji ber çi? Madem wiha ye, tu dizanî.

- Ji ber qawatiyê, ezbenî!

Wî ev gotinên xwe, wekî gulên tivingê avêtin û  
lêxist meşiya, çû.

Dema Camêr ber bi mala meta xwe Xeca ve ket  
rê, hê serê xwe dihejand. Pişt re tif kir erdê û  
got:

- Kerîmê hevalê min ê bendîxanê neheq nebû  
ku her wext digot: "roj roja qawatan e..!" Serê jinê  
di gora bavê Mecîd de be, ji min re çi ye. Ji ber çi  
ez pê sivik bibim. Kî dizane ku em pismam in jî.  
Ji bilî vê, ez ji deftera gelek kesan hatime xerakirin.  
Kî hesabê bi min dike, yan hesaba wî ji min  
dipirse. Xwedê hez bikira rojê zûtir destê min  
bigihîştîya Kalê û Hêwa, soz û qerar bûya, dê min  
wan bibira welatekî wisan ku salê carek me navê

vî bajarî sehnekira!.. Erê, rastî ez ê çî ji peran bikim.  
Ji ber çî ez serî xaniyê xwe nadim, bizanim  
gelo ka çî lê hatiye? Eger kirêdar kavi nekiribe,  
mimkun e îro perekî baş bike. Wek bi bîra min de  
mabe, li gor nama Lawe ku 1i min re nivîsandibû,  
şeqameke fireh li ber re dferbaz kirine û vê jî  
qîmeta wê zêde kiriye.

Berê xwe da rê, lê ev çî ye, tu xanî û manî nayê  
xuyakirin!

Tu bêjî min rê şaş nekiribe.

- Hinek xaniyê rexê wî nêrî. Ev mala Mîrza Seîd  
e. Ev şaneşîna wan a hilweşiya ye, hê tu kesî dest  
lê neda ye. Ev mala Reşeyê Rêncber e, wekî do  
çawan bû îro jî wisa ye. Ev ew kes bû, ku çû ji  
Amexana jina wî re got, biçê li ba Kalê û ser û  
guhê xwe lê bike û ew dê biçê bangî mamanê bike  
û vegere. Tenê xaniyê wan nayê dîtî, tu dibêjî li  
ser kaxez bûye û bi lastîk jê birine! Ciyê wî wekî  
nava kefa destê mirov çawan e, bi wî awayî rast e.  
Gelek bi zû, ket bi bîrê ku yekem car nîn e ciyên  
wiha rastkirî dibîne. Tenê îro heşt-neh ciyên wek  
şûna mala xwe ber çawan ketibûn. Qet lêkolîn û  
lêgerînek jê re naxwaze. Ev ciyên han, xaniyên bi  
131

boldozeran rast kirine, ew in. Bêguman xaniyên  
wan kesan in ku ji aliyê dewletê de gunehkar hatine  
zanîn. Lê gelo kengî wiha kirine? Înşallah ber  
bi azadkirina wî wiha lê nekiribin! Di dema girtina

wî de jî bi vî awayî xanî kavi kirin adet nebu. Lo niha kengî kavi kirine bila bikin, niha wêran e. Lê ji bo çi Lawe min pê agahdar nekir? Mumkun e newêriye binivîse. Lê heta ev meha ku tê de nin jî, kiriya vê kavla han ji min re dişand. Wisan dixuyê, ev çend sal e ku kavi kirine! Ev ew şeqama Lawe jê re nivîsandibû ku du xanî 1i xaniyê wî wê de derbaz dibe. Wey çi zordar û kafirbav in, wisan dixuyê ew naxwazin tenê bi gotin mala xelkê wêran bikin. Eger bê heq û sebeb deh sal davêtin zîndanê, mal bi boldozer rastkirin çi re ye?! Wî nefesek kêşa û ji ber xwe ve got:

- Ev ciyê min û Kalê yê evîndariyê bû. Min ewqas jê re got. em dest lê nedin. tenê em siwax bikin. Lê ji ber dayika xwe çavê min ba nedigirt, ez tê de rûnim, an dibû ez biguherim an jî xera bikim û ji nû ve ava bikim. Kevin bibû, qet kirî jê nedihat. Pere jî yên Kalê bûn. Piştî mirina dayika xwe, avahiyên xwe yên gund firotibû. Heqê wê jî hebû, bêyî ku tiştek di destê me de bimîne, me perên xwe hemû dida kiriya xanî. Kî dizanî em ê tûşî asteng û gelşek wiha bîn! Ez çima naçim seriyek li mala Mame Reşe Rêncber nadim! Malek baş in, di wê roja reş de, jina wî Amexan bi çi rûyekî xweş û geş ve xwest bê alîkariya me. Ka ez herim, bêguman bûyerên wan rojan gelek baş bi bîra wê de ne. Ez ê jê bipirsim û bila ji min re bêje, gelo Kalê çawan zarokê xwe anî, qet maman bi destê wan

ket? Dê li ku destê wan bikeve... kî dizane belkî  
Nazê paş de vegebera, maman bi xwe re neanîbe!  
Amexan jineke xweş sohbet û xwediyê gotinên  
xweş e. Niha dê çîroka min bi awakî wisan qise  
bike, wek ku qet neqewimî be. Çendîn xweş e  
dema ku dibêje: "Bila canê te sax be, qîmeta malê  
dinê tune".

Ber bi derî ve çû û heleqa derî lêxist. Sekinî

132

heta ku derî jê re vekin. Di bin çavên xwe re jî li  
kavla xaniyê xwe dinêriya . A ev ciyê han, oda wan  
a raketinê bû. Di wê roja reş de, Kalê li ser vî ciyê  
xwe yê han raketibû. Wey ew çi roj bû, çû bila careke  
din paş de neyê. Çi bû lo? Mirov dibêje, kesek  
li mal nîn e. Hinek bi tundtir li derî xist, lê tu  
pêjn û deng tune bû. Zarokê deh-danzdeh salî di  
wir re derbaz dibû, ji dûr ve li Camêr nêrî û got:

- Maraol xaltiya Amîne li mala Resulê Dartiraş e,  
kurê wan girtine. Eger tu dixwazî ez bangî wan bikim?

Camêr got:

- Ne giyanê min, qeyî nake, ez ê biçim û carek  
din bêm. Karekî min ê bi wî awayî bi wan re tune!

Zarok dikir biçê, Camêr jê pirsî:

- Kurê baş, ev kavla han a kevin, mala kî bû  
wiha rast kirine?

Zarok hat û nêzîkahî lê kir, bi dengekî hêdîka  
ve jê re got:

- Ez navê wî nizamim! Lê dibêjin mala mirovekî

mezin e û va ye qasek e hatiye girtin!  
Camêr her wekî ji wê bitirse ku kurik bizane  
ew "mirovê mezin" ew bi xwe ye, bi lez pirsek din

jî Jê kir:

- Baş e, tu dizanî ew rêzê dikanên li hemberê  
me, yên kî ne?

- Yên mala Mîrza Qadir in. Hukumetê dikandaran  
jê derxist û da girtin. Çunkî casusekî wan li  
ber van dikanan hat kuştin. Destê wan xweş be,  
gelek mirovekî xerab bû.

Camêr, di ciyê guhê xwe bide bersîva kurik, ket  
bîrê ku gelo Hêwa jî zarokekî wiha zîrek û jêhatî  
ye? Xwezî ew li vir bûya, dê çendîn dinya min biguheriya!

Ji nişka ve cardin Lawe ket bi bîre, ew jî  
van rojan qet nayê xuyakirin. Pêşiyên xweş gotine:  
"Haya têran Ji birçiyên tune", hegene ji bo anîna  
Hêwa. û dayîka wî, bi vî awayî terkexemî hereket  
nedikir. Heta Camêr xwe ji van melhezan rizgar  
kir, zarok dûr ket û ji ber çavan wînda bû. Hêviyeke  
wî bi wî xaniyê biçûk hebû, ew jî hilweşiya. De

133

guhê xwe medê. Xwedê bike Hêwaya wî yê rasteqînî  
bi zû û selamet vegere, êdî hemû tiştek hêsan  
e û dê ev hêviyên wî hemû bînin.

13

Çawan çavê Camêr bi Lawe ket, jê re got:

- Erê, bi rastî te çima Ji min re nenivîsîbû û pişt  
re jî negot ku "xaniyê te kirine ciyê pîvazan?"

Lawe, piştî demekê, gotê:

- Çi ye, tu çûbûyî taxa xwe?

- Tenê riya min di wir re derbaz bû. Lê te çima ji min re negot, "xaniyê te kavi kirine?"

Piştî demeke dirêj, Lawe Jê re got:

- Mimkun e min ji bîr kiribe ku ez ji te re bêjim.

- Nexêr, ji bîr kirin di vî karî de nîn e, ji ber çî ji bîra te neçû kiriya xanî ji min re bişînî û behsa kiriya xanî bikî, çima ji bîra te biçe ku tu bêjî xaniyê te kavi kirine?

Lawe, qek neaxift.

Camêr bi nîv şermokî gotê:

- Li min bibore! Dibû ez bizanim ku ya herî baş û çak, ew bû ku te kir, eger te ji min re binivîsanda "xaniyê te kavi kirine", mana wê ew bû ku perên te ji min re dişand ên te bûn û dûr nebû, min hez nekira yan li min xweş nehata. Niha ez têgihîştîm, ji bo çî te ji min veşartiye, li min bibore!

Lawe, serê xwe kir ber xwe û di dilê xwe de got, mirovê şair baş dikir ku xwe bêdeng dikir û

134

heta xelk bi xwe bi mana şî'irên wî bigihîjin û pişt re jî digot: Ew ji min baştir têgihîştin. A rast jî her ew bû ku wî kir.

Camêr jê pirsî:

- Baş e, ji kengî ve wisa lê kirine?

Lawe bi awakî madekirî, gotê:

- Giyanê min Camêr, ewqas guhê xwe nede dirêjahiya



tiştan. Xaniyê te kavi kirine, êdî pêwistî bi kengî, kî, çawan jê re nake!

Camêr serê xwe hejand û gotê:

- Tu rast dibêjî, baş e, ez jê naxivim. Lê ez nizanim ez behsa anîna Hêwa û dayika wî jî bikim û nekim? Va deh roj bi ser re derbaz bûn hê tiştekanaxuyê.

Lawe, piştî demekê jê re got:

- Heqê te heye, li min bibore! Van rojan hinek sergêjiyên min hebûn, ji sibê şûn de ez ê lê bixebitim. Baş e, ku niha dinê jî hinek hêmin e.

Camêr ciyê bi Lawe re biaxive, di dilê xwe de ji xwe bi xwe re digot: Tiştekan ecêb e, sergêjiya çî û hebûna karê zêdeyî çî? Ez heta niha jî nizanim karê te çî ye? Wisa li min hatiye, hindik maye ez bêjim, tiştekan te yê aşkera tune. Çunkî tu jî wek min beyana sibê derdikevî derve û nîvrojê ji bo nanxwarinê tê, serê xewa xwe dişkînî, seet dûrî pêncan diçî derve û heft û heft û nîvan cardin tê. Edî sergêjiya çî? Madem wiha ye, qet wextê te çênabe tu mirovek bişînî pê Kalê û Hêwa ve? Ez nizanim ji bo çî tu evqas terkexem bûyî? Tu, tu wextî wiha nebûyî! Baş e, em dê bi hêvî bin, ka dê sibê tu çî bikî?

Nîvro wextê xarinê Lawe nehat xuyakirin. Dema Camêr pirsê wî kir, jina wî jê re got:

- Çûye bajarê "H ...", dê çend roj şûn de bê. Bi lez bû û tu jî li vir nebûyî, ji ber vê jî te re negot.

Pênc roj bi ser çûna Lawe de derbaz bûn. Camêr  
gelek ji taqet ketibû, melheze dikir, bi xwe jî

135

ecêbmayî dima. Çawan ew dikarî demek evqas dirêj  
bê Hêwa û dayika wî tehemmûl bike. Berî ew  
girtî bû û tu çarek wî tune bû, lê niha tu manayek  
di van panzdeh-şanzdeh rojên mala Lawe de derbaz  
kirin, tune bû. Her çawan û çî dibû bila bibûya,  
dibû xemek Ji bo hatina wan bixwara. Ya rast, heta  
niha, ji bo vî karî qet xwîn Ji xwe bemedabû.

Tenê ev ji ber sebebê xweşiya berdan û azadbûnê  
bû. Va Lawe jî çû, kî dizane dê kengî bê? Ji bo çî  
ez bi xwe hewlek nadim? Ez ê hewlê çî bidim? Kî  
bi gotina min xwe dixe vî agirê han? Wekî Şaho  
wan digotin, bê "îzna" karbidestên asayiş û eskerî,  
kesek ji bajêr nikare derkeve derve, ji bilî riya  
qaçaxî, ew jî tirs kuştinê tê de heye. Meh tune  
bîst û sî kes di vî riyê de neyên kuştin. Vêca ger  
rewş wiha be, ez dikarim kê bişînim pê wan?.. Di  
milekî de 1ê Lawe neheq nîn e. Lê her dibû, madem  
ku dizanî dema berdana min nêzîk bûye,  
nehîştta ew biçin gund! Bi taybetî di van rojên têkelhev  
û nexweş de ku xelk ji gundan tînan bajarin.

Qet nebû ji bomberanê dûr diketin. Niha jî qet  
pêwîst nake ji kes re bêje, heta ji Lawe re jî. Tenê  
riyek heye, ew jî ew e ku bi xwe biçê. Lê çawan?  
Ji bo tirs û nexweşiya rê hemû kes wek hev in, lê  
ji bo wî di serbar de, tirs dayira asayişê jî heye,

ku jê re gotin, bê agahdariya wan ciyê xwe neguherî,  
nexasma bi ser tevan de çûna gundan. Ser van  
tev rewşan de jî, her çi dibe bila bibe, geleke biçe,  
mirin û jîyan be jî!.. Rewayê heq nîn e, di vî riyê  
de ji xwe pê ve kesekî din tûşî eziyeta vê erkê  
bike. Ew yeka dayira asayîşê got, tenê gotin e. Ew  
çi dizanin ez li vir im an min ciyê xwe guherandiye?  
Va du hefte zêdetir e ku ez hatime, min hîsa  
tu casusek nekiriye ku pê min ketibin. Ger bi sax  
selametî biçe û bê, ji xwe kesek pê nahese, eger  
bê kuştin, Ji xwe zanîn û nezanîna wî wek hev e. Ji  
bilî vê, eger çû û Kalê û Hêwa anî û pişt re agahdariya  
dayira asayîşê pê çêbû ku bi bê agahdariya wan  
wî bajar terk kiriye, dê çi jê bikin? Ma qey  
nakûjin! Zêde zêde ew dê wî bişînin bajarekî din.

136

Ji xwe ev hê xweştir e!

Dest li ser destan û qewet Ji Xwedê! Ji sibê  
zûtir rpj nîn e, ew dê bikeve riyên nepenî û bi dizî  
ji bajêr derkeve. Dema ew ji bajêr derket, êdî her  
tişt hêsan e. Bi xwe, gelek baş şarezayê riya gundê  
mala meta Kalê ye, ne pêwîstê rêber û ne jî yê  
beled e!

137

14

Di sefera Camêr de, tirsar herî mezin derketina  
ji bajêr bû. Çunkî hemû ew rê û şeqamên ku ji bajêr  
diçûn derê, yan dihatin bajêr, di bin

çavdêriyeke tund a giran de bû. Ji bilî vê, li wan  
ciyên bilind ên ser riyan jî, kemînên şeştîran damezrandibûn.

Yên di şeqaman de bi "îzîn" nediçûn  
balêr û demediketin, bi bê pirs û sual didan ber  
gulan û dikuştin. Hefte tune bû laşên çend kesan li  
ber deriyê Serayê ranexin. Ev jî ne ji ber wê bû ku  
kes û kûsên wan kesan wan binasin û laşê wan  
xwedî derkevin û bibin, ev, Ji ber wê bû ku çavên  
xelkê bi vê yekê bitirsînin. Çunkî kesek tune bû  
biwêre xwe bike xwedanê van laşên kuştî...

Camêr, tenê ket rê û li gor eqlê xwe riya herî  
kêm tehlûke bijartibû. Lê wisa derneket. Çunkî  
dema ew bi ser çepeliyên xwe di nav kaviên ber  
girek re derket derveyê bajêr, projektorek tarîtiyê  
dirand û qasî şeş-heft deqîqan der û dorên wî kir  
wek navarojê. Şirqîniya şeştîran dest pê kir. Camêr  
xwe bi erdê ve pelizand heta dengê gule û  
teqînê sekinî. Pişt re xwe bi xûşilandî ser zikê  
xwe gîhande newalek teng. Ji wir ew ket banzdanê  
heta ku ji hukmê gulê derket. Roja duyem ji  
karwanciyan seh kir ku ew şev, zarokek, jinek, du

138

mêr û sê hêstir hatine kuştin.

Dema xelk ji bajêr derdiketin derve, êdî desthilata  
dewletê li ser wan nedima û diketin bin  
desthilata "L.A.N". Camêr her çendîn gelek caran  
ew rê û ban dîtibûn, lê wek yekî nenas, her dem  
ew di şikê de bû ku şaş biçe. Ev yek jî ne ji ber wê

bû, ku deh salî zêdetir ser dîtina wî ya li wan deveran  
a cara dawîn re derbaz bibûn, an jî ku gundên  
Kurdistanê di navbera van deh salan de jê re  
guherî bûn! Sebebê serîlêgêjbûn û ecêbmayîna wî,  
ew tiştên bi ser navçê de hatibûn, ew bûn. Yek ji  
wan çayxanên ji şewatê, darek ji wan baxan an jî  
pele çinarek li fewtandinê rizgar nebibûn ku gelek  
caran, dirêjahiya riyên ji rêwîyan re kurt dikirin.  
Piraniya malên wan gundên ku ketibûn ser rê û  
dirban, yan ber bomban kavi kiribûn yan  
şewitandibûn. Beşê piraniya xelkê wan jî muhacir  
bibûn. Hinek ji wan çûbûn bajaran û hinek ji wan  
jî derketibûn çiyên. Camêr, roja yekem gelek  
meşiya, ji bilî qirçe qirça germaya naverojê, ku wî  
mecbur dikir ji du-sê seetê carek ber bi kanî û  
avek de bibe, tu tiştî ew neda rawestandî. Wî  
berê xwe dabû rê û tenê meş di hişê wî de hebû.  
Êvarê, wî berê xwe da gundek ku çend malek tê  
de mabûn û derneketibûn. Ew jî berê beyana sibê,  
bi xwe bi mal û heywanên xwe ve diçûn nav newalên  
kûr û di nav dar û deviyên der û dorên avahiyên  
xwe, heta roj diçû ava, ji tirsê bombebaranê  
nedihatî. Dema roj diçû ava, pişt re dihatî gundê  
xwe. Dema Camêr ket gund, hinek ji wan nû  
hatibûn û mijûlî agirkirin, xwarin çêkirin û nanpehtinê  
bûn. Camêr du palas ji malek xwest û çû  
serbanê mizgeftê. Xwarin û nan manê xwe dendst  
û dest bi xwarina şîva xwe kir. Gelek ji wê fikra

xwe kêfxweş bû ku nan û pêxwarinê li gel xwe  
anîbû, hegene ew dê bûya bar li ser van gundiyên  
rebenê feqîrê mal li wan hatî şewitandî. Wî para  
xwe ya sibê jî hilda, çawan bûya, dê wextê şîvek  
dereng xwe bigihandaya Gulan, dê şîvê li gel Kalê  
û Hêwa bikira... Dema Kalê û Hêwa hatin bîrê, şaş  
139

û ecêbmayî ma ku serê sibê heta niha nehatibûn bi  
bîra wî û ger hatibin jî, ewqas dîqeta wî  
nekişandibûn! Bêguman tirsarê, melheza pirskirina  
dewletê, bêdeng di cîh de hiştina mala Lawe,  
kavil, malwêranî, têkçûna rê û banan, eziyet û  
îşkenca li ser xelkê tê de dijiyan, mêjiyê wî tejî  
kiribûn, bi awakî wisa ku dikirin cî ji Kalê û Hêwa  
re jî nenêlin. Çavê xwe li lehêf, doşek û balîva xwe  
ya gilover gerand, ku heta wê demê ji ber acizbûn  
û birçîtiyê dîqeta wî nekêşabûn. Balîf, ji qirêjiya  
xwîdan, toz û xubarê hatibû molekirin, nedihat  
zanîn rengê rûyê wê ya berî çî ye. Çar rexên lehêfa  
wî, ji aliyê kirêjahiyê ve hatibûn abluqe kirin. Betanê  
lehêfa wî ya sor, du-sê cîyan de dirabû,  
pembûyek gewr ji kûnên lehêfê derketibû der.  
Pişteka wî jî, ku ji qumaşek kesk bû, têk çûbû û  
çend pelên gewr ên ji ber rijana tiştekan an mîza  
zarokan, pê ve nexş çekiribûn! Kulava binî ji tevan  
paqijtir bû. Tenê ciyê çend îskanên çayê yê  
danîbûn ser û yê çend şewatên cigarê pê ve diyar  
bûn. Qirêjî û pîsîtiya van nivînên han, wan rojên

hukum danê û birin zîndanê bi bîra wî xistin. Wey  
çi nivînek qirêj û pîs danê! Lê ji wan nivînan re  
qet xem tune bû. Ew girtî bû û li gor dewletê gunehkar  
bû. Cil û nivînên qirêj, beşek ji cezayê wî  
bû. Lê ev gundiyan belengaz û feqîr, li gor xwe û li  
gor hemû nesaban bêguneh û azad in, ji bo çi divê  
ev halê cil û nivînên wan be? Qet dûr nîn e, yê  
dan min, nivînên wan ên herî baş û paqil bin, ji bo  
mêvanan hildabin. Berkenînek tahl xwe berdan ser  
lêvên wî. Şax û çiqên çinara mizgeftê ya pîr, bi ser  
banê mizgeftê de tewiyabûn. Di wan demên hê xelkê  
ji tirsê firokan gundên xwe vala nedikirin, bi  
roj dibû siyek xweş ji wan kesên ser dik, ferşên  
limêjê û ber devê hewza ava binî rûdiniştin. Lê, êvaran  
xem û kulek bi şînê dixist dilê mirovan an jî  
qet nebe wê êvarê li gora Camêr wisa bû. Pişt re  
ciyê xwe raxist. Serban li ber bû, heta karî berika  
xwe dirêj kir, lê melheza "cîyê cema'eta" du-sê nimêjkerên  
serbanê, bûn sebeb ku ji siya pîre çinarê

140

dûr bikeve. Tîk û tenê riyek di girê- hemberê wî  
ve dikêşa û dihat nav gund. Wisa dixuya temamê  
avahiyên wî gundî, xwe li ber wî girê veşartibûn.  
Çunkî xelk, wekî karwana mêrûyan bi pez û dewar,  
jin û zarokên xwe ve tê de dihatin nav gund.  
Heta tarîtiyê bi ser de girt, saniyek çavên xwe jê  
neda alîkî, ger çendîn, gelek caran bi xeyalan ewqas  
li wir dûr diket, tarîtiya ser wê dirb û riyê

deyne milek, heta qurmê sitor ê çinara ber çavên  
xwe jî nedidît.

Mirovekî nimêlker ber bi wî ve hat, wisa dixuya  
tîniyê deng û behsan bû. Lê Camêr bi awakî wisa  
sar bersîv dayê, fesala rûniştinê jî neketê, her bi  
piyan ve yek-du pirsan jê kir û lêda çû ba hevnimêjên  
xwe, tenûra xeberdanê vexistin û aşê xeyalê  
xistin ger. Camêr jî di destpêkî de bi qasekî guhê  
xwe da wan, lê qasekî şûn de taqeta wî nema.

Serê kulavê ya jêrê pêça û bi pêlavan ve serî danî  
serê û pal da. Piştî demek xwe gevaztina vî milî û  
wî milî, ew bi lez rabû çû balîfa wek bangirdanê ku  
ji ber giraniya wê bin şaxên çinarê de bû, anî. Qasek  
bi nizm kirin û pan kirina wê ve mijûl bû,

piştî wî serî danî ser û piştî çend caran ser vî  
teniştê û wî teniştê xwe vegûhestinê, bê deng bû.

Gelek ser de neçû, eksê carên din xirînê pê ket.

Dema hişyar bû, hîv rimek zêde bilind bibû. Wî  
xwe şidand û nivînên xwe bir mala xwediyê wan.

Her çendîn reyîna san nehiştin, wekî hez dikir,  
bêdeng têxe ser dîwara nizm a serdera xanî û milê

rê bigre û here. Hîv di dema xwe ya çarîka sêyem  
de bû, bi tîrêja xwe ya zerê xumam, deşt û çiyar

ronî kiribû. Dar û ber têkelî nav siyan bibû, ji dûr  
ve wek gir û çiyayên biçûk dihatin ber çav. Gelek

stêrkên biçûk û dûr ên asîmanan, ji ber roniya

hîvê û nêzîkahiya beyanê, ji ber çavan winda bibûn.

Tenê çend stêrkên geş ên vî milî û wî milî,



pençên xwe li pençên hîvê dixistin. Lê bi hereketên  
xwe yên zêde û lez ên li ber çavên belek a hîvê,  
te digot zarokekî biçûk ê nû ye, bi kincên nû xwe  
dixemilîne. Dinya hênik û bêdeng bû. Ji bilî dengê  
141

piyên wî ku zêde dihat guhên wî, tenê dengê dihat,  
ew jî dengê qirçeçirça bêdengiyê bû. Di  
biçûkatiya wî de jê re gotibûn, ev dengê xurmîniya  
çemên cennetê tên guhê mirov. Wî melheza dinê,  
asîmanên bêser û binî, stêrkên bêhejmar, rojên  
borî, rojên bê, şoreş, jiyana wî xelkê û ya bi xwe  
dikir... Hêdî hêdî hişê wî dihat ser Kalê û Hêwa û  
ji xwe bi xwe re digot: bi rastî demek wiha têkelhev  
û aloz de ku xelk ji gundan baz didin bajaran,  
nedibû Lawe bihîştta ew bînd gund. Tu gundiyekî  
belengaz û bêçare cî û warek ji zarok û mala wî re  
maye ku bi ser vê de jî, mêvanan bihewîne! Bêguman,  
mimkun e Lawe ji wan bezar bibe. Heqê wî jî  
heye. Van qas demên dirêj de bêşik gelek aciz kirine.  
Bi gotin xweş e, mirov deh salan xizmeta jin  
û zarokê xelkê bike. Ji tevan ne xweştir jî ew e, tu  
çi tiştê ji wan re bikî, tu nikarî wan wekî ku tu  
dixwazî dilxweş bikî...  
Ji nişka ve xeyalek hat bîrê û dilê wî givaşt. Qet  
dûr nîn e, ew jî wekî hemû van gundiyên han bi  
roj gund vala nekin û neçin çiyar, nepenî û newalên  
der û dorên xwe! Li gor vê, îro jî çavê wî bi  
wan nakeve. Madem wiha ye lezkirin bê feyde ye.

Ev yeka han berî bi bîra wî bihata, ewqas zû ranedibû  
û bê tune xwe ji xew nedikir û nedibû kolê  
şevê. Va gundekî nû hat! Divê ez xwe li vir mijûl  
bikim ku piştî rçjavayê bigihîjim avayiyan. Ez çî bikim,  
dibe ku ez her ji nîvro ve wekî qazekî kor tîk  
û tenê bi serê xwe herim gund?

Camêr, bi carek, ji wê kişt û zîrebûna xwe sist  
bû. Çavên xwe kiribûn dirba rê û dimeşiya. Car û  
baran, germiyê ew mecbûr dikir, ew berê xwe  
bide bin siya darekî li rexê rê ku di wê navçê de  
hê destê dijmin negihîştibûyê, aciziya xwe ser xwe  
hilde û cardin bikeve rê. Wexta xwarina nanê  
nîvroyê ya dereng bû, bi awakî ecêb û nedîtî,  
çayxanek neşewitandî nat xuyakirin. Di seranserî  
rê de, hemû çayxanan wêran kiribûn. Ew ên destê  
dewletê gihîştibûnê şewitandibûn û yên destê wan  
negihîştibûnê jî bi firokan ji asîmanan ve bomba-

142  
ran û agirbaran kiribûn. Bi awakî destlênedayî  
çayxanek wiha di vir de, li gor Camêr tişteki ecêb  
bû. Dema ber bi wê ve çû, dît ku hemû melzemeyên  
çayxanê Ji çend qenepe, kursî, sergînên belav û  
welav û agirdaneke sar u cemidî ne. Ji ber xwe ve  
û bi dengekî hinek bilind got:

- Çayxana çî? Ji wan çayxanên hatine kavi kirin  
wêrantir e. Dilê min pê xweş bû û min got ez ê  
çayek vexwim!

Ew çû li ser qenepekî rûnişt û dema wî xwest

pal bide, deriyê odek di nav çayxanê de dît. Ji ber vê, rabû ser piyan û xwest bizane gelo ka ev çi ye. Dît ku zarokek tazî yê çîqil rût û ser û çavên wî çîrt, destên xwe dane ber çavên xwe, milê rê girtiye, dixwaze bizane, gelo ew dengê çi mirovê bû hat. Camêr vê yekê firset zanî û gotê:

- Kurê baş, ji bo çi çaya te tune?

Zarok di ciyê bersîvdanê de, bi lez vegehiya hindurê odê. Gelek di ser re derbaz nebû, wî dît, jinek ciwan ji derî ve, nivê serê xwe yê pêçayî derxist der û bi awakî gelek bi tirst vî mil û wî milê xwe nihêrî. Dema dît ku yên ew ji wan ditirse nîn in, ew hat di nivê derî de sekinî û bang kir:

- Ew kî ye?

Camêr, piştî vegehiya zarokê hindûr, Ji ber bêhêvîtiya çayvexwarinê xwe li ser qenepê dirêj kiribû, heta 1i ber dengê jinikê serê xwe ranekir, hevûdu neditin, piştî gotê:

- Ez im xwîşka min, ez rêwî me û min got eger çaya te hebe yek û du çay bidî min!

Jinikê berî bersîvdanê, axînek kêşa û bi nêrîneke xem û kul, li serî û heta binî li Camêr nihêrî û got:

- Fermo were serê jorê, ez ê niha ji te re çay bînim.

Camêr, wek xêrek lê bikin, bi tirs pirsî:

- Xwîşkê, gelo hêkên we hene, tu ji min re

bixaşînî û yan bikî hêkeron?

- Belê hene, tu çawan dixwazî?

143

- Eger ji te re zehmet nebe, ji min re hêkeron xweştir e, lê têkelhev neke.

- Baş e, ser çavan.

Ew qasek sekinî û pirsî: Wisa dixuyê kekê min xelkê van deran nîn e?

Camêr, fikir bipirse ku tu çawan dizanî, lê pişt re ji wê yekê tirsê ku dirêjkirina axaftinê, wî nêzîkî jinikê bike, ku ew ne tenê hinek sivik heta ciwan jî bû. Ji ber vê, serê xwe hejand û bêdeng bû. Ber bi axaftinê re ew hat nêzîkî wan kursiyên ber derê odê û li ser a herî dûr rûnişt. Jinik jî bi çay anîn û hêk çêkirina xwe ve mijûl bû. Ewqas bi ser de neçû, bi tewek û li gel du-sê perçe nan li ser sêniyek teneke ya kevin, anî berê. Bi xwe jî çû li hember, li ser kursiyek rûnişt. Ew hê baş li ciyê xwe rûneniştibû, jê pirsî:

- Kekê, ez nizanim tu çay bera hez dikî yan ez pişt re ji te re bînim?

- Dawiyê baştir e.

Qasek bêdeng bûn. Di vî navê re, du se bi mil xwarî û gelek bi nevsokî ber bi Camêr ve hatin. Camêr, wê demê li ber pariya nanê birina devê xwe re, xeyala wî ber bi Kalê û Hêwa de çûbû, heta koçikan ew kirin tengiyê û xeyalê bi ser de qut kirin. Koçikan milê xwe jê re gij kirin û serê xwe

hildan û ber bi asîmanan ve zûriyan. Camêr, bi naçarî perçek nan avêt ber wan. Li ber xwe ve wî got:

- Wisa dixuyê ew gelek birçî ne.

Jinikê, dixuya ji bîra Camêr çûbû, ji nişka ve gotê:

- Rêbarî û hatin û çûnên me nemane, em jî û ew jî birçî mane. Ger bi vî awayî here, em ê tev ji birçiyên bimirin. Tu yekem kesî di navbera hefteyek de ku yê çavê me pê dikeve. Heta mêrê min nehatibû girtin, hê baştir bû. Lê piştî ew hatin girtin, ez naşikirînim û Xwedê 11 min negre, deriyê rehmetê bi ser me de hatin girtin. Eger bi vî yekê jî bisekine hîn baş e! Ez ditirsim wan bikûjin û çayxana me jî bişewitînin.

144

Van gilî û gazindên jinikê dilê Camêr şewitand.

Bi awakî kul û kerb pirsî:

- Mêrê te ji ber çi hatiye girtin?

Jinik, demek dirêj sekinî û baş li Camêr nêrî, sîya çayxanê ku hinek ciyê wê tarî kiribû, axînek keşa û got:

- Ji ber bedbextiyê ji aliyê "L.A.N" ve hatiye girtin!

Camêr, li hemberê xwe têkelkirina vî karî han gelek poşmam bibû, çunkî seh kiribû ku "L.A.N" xelkê ji ber çi digre. Li gel vî jî. bi awakî ne jidil pirsî:

- Ji ber çi girtine?

Jinik. wek çaveriya vê pirsê bike yan gelek caran jê hatibe kirin, bi lez gotê:

- Ji ber çayxana me nehatiye xera kirin!

Camêr, ji ber xwe ve got:

- Çawan? Ji bo ku çayxana we nehatiye xerakirin, vêca gunehê we çi ye?

Yan Ji ber pirsê yan Jî bersîveke devê wî girê bide, hatibe bîrê, çiqas diçû wî xebirdan xaftir dikir, jinikê gotê:

- Dibêjin eger hûn casus nebûna, dewletê dê çayxana we Jî xera bikira! Vêca tu bi Xwedê, ev rewayê xeq e? Pîr û meşayiq bi me ve bidin û ez, mêrê min û hersê zarokên min negihîjin êvarê, eger me xerabiya şoreşê xwestibe. Ji xwe, eger em bêguneh in, bila bela ser sebebkarên me de bibare. Ez bi xwe dizanim, tiliya kî di vî karê de heye. Qeyî nake, Xwedê ahê bizina kol li ser bizina şaxnahêle...

Herdu bi hev re bêdeng bûn. Piştî demek, jinikê jê pirsî:

- Ez niha çay ji te re bînim?

- Erê bi Xwedê, lê bila gelek giran nebe.

Camêr, çaya duduyan vedixwar, jinikê gotê:

- Gelo tu cigare nakêşî?

- Belê welle ez dikêşim, lê wekî tiştêk ji bîra min çûbe, ev jî nîşana xêrê ye, ger wiha be, ez dikarim dev jê berdim û xwe ji vê belayê rizgar bi-

145

kim!

Jinikê bi pêkenînek şermokî, xwest biaxive, lê  
Camêr bi awakî fedîkirî gotê:

- Li min bibore! Fermo kerem bike, pakêta cigara  
min ji te re.

Wiha got û pakêta cigarê û şixatê avêt ser masa  
li ber wê, wê jî bêdeng hilgirt. Cigarek jê vêxist û  
pakêt û şixatê kir ber teniştta xwe. Camêr, dixwest  
pirsa ciyê avê bike ku dest û rûyê xwe bişo. Ji jinikê  
pirsî:

- Bi rastî xelk li ku destê xwe dişûn?

Jinik rabû, piçek sabûna li ser pakêta cigarek  
kevin hatî danîn, jê re anî û gotê:

- Here ser kaniyê, va li pişt çayxanê ye, bi vê  
coyê ve here, ew dê te bibe ser.

Camêr dema ji destşûştinê vegeriya, melheza  
jinikê dikiş. Keweke gelek baş e, destê mirovê  
xwe bikeve, av li ser venaxwe. Sipehi ye jî. Çi? Sipehî?  
Guneh jê tê, mirov nebêje, reh sivik e. Ev  
tenhaya han jî firsetek baş e ji bo ew kesên bi  
tiştên wiha digerin. Ya baş ew e ez biçim. Ne bi  
Xwedê, eger perçe sîpalek hebe bide min, ez bin  
vê darê tûya han serê xewa xwe bişkînim û dema  
esrê bikevim rê ji tevan baştir e. Bin vê qirçeqirça  
germiyê, ez ê bi ku ve biçim? Riya min tev li ser  
hev seetek maye, ez ê ser vê milê bikevim û vê  
baska han a dirêj bibrim û bigihîjim avayiyên wan.  
Her çendî mala xaltiya Kalê li milê din ê gund e,

lê dema mirov gihîşt gund li wir tê hesêbê. Jinikê berik û balgiyek paqij jê re anî û pişt re jê re got, tu biniya siya çayxanê rakevî baştir e, ji derve dê mêş te bixwin. Berî ku Camêr devê xwe veke, qîjîna girîna yek ji wan zarokên wê, dayîkê ber bi odê de bir û Camêr jî bi lez xwe gîrande bin dara tûyê, destmala xwe avêt ser çavên xwe û xwe dirêj kir. Dema dengê jinik û zarok sekinî, wî nedizanî ka çawan ew dê rakeve. Pêşî wî xwe bi xew danî, lê beyhude bû, xew re neçû. Jinik jî ku li ber serî sekinî bû, xwe zivirandina wî firset zanî û gotê:

- Rabe, balafir hatin li ser me difirin, Xwedê me 146

biparêze! Ez nizanim biniya darê baş e yan na? Li gel vê jî, min kiriye adet dema ku balafir tîn, ez destê zarokan digirim û tînim biniya vê dara tûya han. Mimkun e ciyek xerab nebe, pez û dewarên min ji derve nîn in. Dibêjin heywan, karwan û tiştên wiha ji aliyê balafiran de baştir tîn xuyakirin. Camêr, dema dît mesele girîng e û jinikê jî biryar daye nehêle ew rakeve, bi naçarî rabû, dest û çavên xwe şuşt û ji bo webalê ji xewrabûnê têke stûyê jinikê, jê pirsî:

- Ev çi ye, te ew anine, tu bişûyî? Bi rastî ew gelek qirêj in, rewayê heq nîn e, ev kanî û ava han li berdestê te be û zarokên te jî evqas pîs bin.

- Şuştina çi birayê min, balafir hatine balafir, va ye hatin ser me. Wey xweliya dinê serê min, ev



gurmîna bomban e. Guhên xwe bigre, guhên xwe!  
Eva didu, Xwedê dizane, mala kê wêran kirin.  
Li gel van xeberdanan, dengê firokan zêdetir  
nêzîk bûn û heta ji nişka ve, zanîn ku ser serê wan  
re derbaz bû, heta jinikê serê xwe jî tewand, wisa  
dizanî ger wiha neke dê serê wê bikevin. Qîjîn û  
gurmîna firokan hê ji guhên wan derneketibû,  
cardin hatin ser serê wan re derbaz bûn. Bi derbazbûna  
wan re, du gurmînên mezin ew tê gihandin  
ku bombe li nêzîkî wan ketin erdê. Ji bilî yê,  
ji ber ciyê wan yê çal di der û dorên xwe de tiştek  
nedidîtin. Jinikê bi gurmîna bombeyan zarîn kir û  
got:

- Way malik li min wêran be, welle çayxana me  
bû. Çavê hesûdan... milê zarokên xwe berda û wekî  
dînan ber bi çayxanê ve baz da. Camêr destê xwe  
avêtê ku bigre, lê negihîştê, ew wek gulê tivingê  
bi wî awayî çû. Ewqas bi ser de derbaz nebû, cardin  
vegeriyan û vê carê ji pêşiyê ve bi şeştîran ketin  
rêtinê û dawiyê bombayek berdan û berê xwe  
dan rê û çûn. Ev ên han hemû bi ser hev, çend  
deqîqeyek kêşan. Camêr, milê zarokan girt, yê  
biçûk di landika ber kaniyê, di cîh de hîşt. Dema  
derket ser bilindahiyek, lê nêrî ku wisa li çayxanê  
147

kirine, kevir 11 ser kevir nehîştine û wêran kirine.  
Li ber derê wê jî jinika xwediyê çayxanê ser dev û  
rûyê xwe ketiye erdê. Camêr wisa zanî, wê ji bo

xweparastina ji bomban ser dev û rûyê xwe avêtiye.

Bangê wê kir:

- Rabe, xoçka min, bombaran nema!

Wî dît ku tu hereket tê de tune. Berê xwe da balê, lê nêrî, bombeyek mûriya pişta wê şikandiye û wê bêreh kiriye. Du zarokên we ku di temenê heşt û deh salan de bûn, ketin girîn û zarînê. Camêr di ciyê xwe de, çend deqîqek wek darê çik ma sekinî. Pişt re laşê wê vegerand ser pişt, dît, di destê wê ya girtî de kêsek heye. Têgihîşt ku çi bûye sebebê kuştina wê. Bêguman çend dînarek e hildaye ji bo rojên xwe yên reş! Wî di qul û derzê dîwarên çayxananê de veşartîye û niha tirsîyaye çayxane kaviil be yan bişewite û keda wê biçe kîsê wê û va ye, niha jî liyana xwe di wî riyê de da. Lê niha Camêr dê çi bike? Nikare here û vî laşê han û van zarokan ve li vir bihêle. Ew di van melhezan de bû û vî milî û wî milî dinêriya, dît laşê sê mirov û çar heywanan milê din rê ketine. Eê madem wiha ye, firokan ew rêwî dîtine û vê facîa han qewimandine.

Qeza, bela û hîlên dewletê serê wê û

hevalên wê de be. Camêr yek ji wan zarokên li ser laşê dayika xwe digiriyan, pirsî:

- Qet pismam, xizim û kesek we li van nezîkahiyan tune?

Zarokê bi kelegirîn, 1ê re got:

- Mala bapîrê min li N..." e.

- Baş e, eger nêzîke here bangî wî bike, va ez jî

dê biçim zarokê şîrmij bînim vir.

148

15

Dema Camêr ket rê, hê du seet û nîv roj mabû.  
Hemû ev bûyerên han, di navbera çend deqîqeyan  
de qewimîn. Hê di nav şaş û gêjiya bûyerê de bû.  
Wî yên hatibûn kuştin nas nedikir. Lê mirina wê  
jinikê ya ji nişka ve, li ba wî ji tev jiyan, lawînî,  
xem, hêvî û daxwazan zêdetir bû, wekî tişteke wî  
gêj kiribû. Xwezî wî ew nas nekira, wê jî wek  
kûştîyên din dê daxek bê cî daniya ser dilê wî û  
biçûya. Lê niha, piştî naskirina wê, her çendîn  
heta mir jî navê wê nedizanî, lê heta rojek jiyan  
wî hebe li vê dinê, ew wê ji bîr nake. Daxa wan  
zarokên sava, dê tu carî ji dilê wî dernekeve.  
Xwedê dizane mêrê wê maye yan miriye. Bi rastî,  
bi bahayek gelek giran, dikare bêgunehiya xwe  
îspat bike! Teh, çiqas giran li ser rûnişt! Jinika belengaz  
çawan xwe ji bo sê dînanan da kuştin! Li ba  
wê wisa bû, bi wendakirina wan sê dînanan dê bibe  
parsker, nedizanî dê bibe sebebê xwîna wê. Camêr,  
di van fikir û melhezan de bû, ji çiyê, di milê  
wî yê rastê de, hatina çar-pênc mirovan dîqqeta  
wî kişand û zincîrên bîra wî qetandin. Dema qasekî  
din wan nezîkahiyê lê kirin, wî dît ku ew

149

van çiya û baniyan de bi çekdar in dijminê dewletê

ne, lê deh sal jiyana zîndanê wisa li wî kiribû, ji hemû çekdaran bisilike. Ji ber vê, bêyî vê ji bîr bike, gavên xwe firehtir û meşa xwe siviktir kir. Lê hewildaneke bêfeyde bû. Çunkî riya çekdaran di pêşiya wî de dihat ser wê riya ku ew dê tê de biçe. Hêvî jî nedikir ku berî wan ji wê duriyana wan digihîne hev, derbaz bibe. Ji ber ku, riya wî hevraz û yê çekdaran jî nişûv bû, her dibû rastî yekûdu bîn. Melheza vegeerê kir, lê çima? Ji ber çi ev tirsana han a bêcîh ketiye ser? Ev çekdarên han, eskerên azadiya welat in, polîs û eskerên dewletê nîn in. Tebessûmek şermokî ket ser lêvên wî û wê bi daxwazeke aşkera meşa xwe giran kir. Lê ewqas zêde bi vî awayî ser wê biryara xwe nema, cardin ket meşa bi lez, nexêr, ket ji rê derketinê, te digot çekdar 1ê ber bi wî ve tîn, car û baran ji ber gunî, newaf û deviyar yekûdu wenda dikirin. Lê piştî, cardin dlketin pêşberê hev û hev didîtin. Çiqas diçû li hev nêzîktir dibûn.

- Neçe, heval!

Yekî ji wan bangî Camêr kir. Vê yeka han jî qudum û taqeta dest û piyên wî şikand. Wî ne dikarî bimeşe, çunkî berî ku bisekine mecala wî yê meşê nemabû. Qasî mirov çavê xwe bigre û veke, gihîştin balê û wî kirin bin abluqê. Sê kes ji wan xwe dan erdê û lula tivingê ber bi wî ve kirin û diduyên din jî ber bi wî ve çûn.

- Tu kî yî, heval? Bi ku ve diçî? Destên xwe hilde!

Camêr, gelek xebitî heta ku bi dengekî bêlerzok û  
bêtirs bêje:

- Babo, ez yekî rêwî me, ez ê herim gundê Gulan.

Herdu çekdaran bi hev re dest bi kenê kirin û  
yekî ji wan got:

- Bi Xwedê tişteki baş e. Tu laşên şewitî dihejmêrî  
yan xaniyên kavilkirî?

Camêr têngihîşt ka mirov çî dibêje, Ji ber vê, nezanî  
ka ew dê çawan bersîv bide. Camêr bi ecêbmayî  
di navbera wan de sekinî û çavên xwe li wan  
gerand, ku bizane ka gelo henekan pê re dikin an  
150

tişteki din?

Çekdarê yekem bi awakî toreyî qêr kir:

- Bi axive, em bizanin ji ber çî devê te wek davikê  
hatiye girtin? Rast bêje, tu kî yî û diçî ku?

Camêr, çiqas diçû, hîn zêdetir ji tirsê dor û berê  
xwe digihîşt, heta karî bi awakî jîndarî got:

- Navê min Camêr Bayiz e, ez ê herim gundê Gulan, zarokên  
min li wir in, li mala xaltiya xwe ne, wan bînim.

Çekdarek bi nermî Jê re got:

- Heval, tu yan gelek ker î yan gelek zanayî!

Çekdarê diduyan jî hilda û gotê:

- Yan Jî tu me ker dihesibînî!

Çekdarê yekem gotê:

- Belê. yan Jî tu me ker dizanî!

Çekdarê diduyan gotê:

- Qet dûr nîn e ew casus be û Ji aliyê dewletê ve hatibe

şandin ku bizane ka gelo netîca bombarana wan çawa  
bû?

Yê yekemîn gotê:

- Belê, qet dûr nîn e.

Yê sêyem, ji ciyê xwe yê nepenî ve qîriya û got:

- Bêşik û guman ew casus e. Em ji ber çi ewqas diçin ser?

Xwe bidin milek ez wî bikim qurbana gulleyek!

Çekdarê yekem, gelek lome li çekdarê sêyem kir û gotê:

- Ji bîra te çû ye, hemû bi ser hev pêr bû, ku ji me re gotin,  
nabe em casusan blkûjin, divê em bibin qerargehê û malumatên  
ji jiyana wî qîmettir jê bistînin, wî çaxê, eger  
bixwezin em ê bikûjin.

Çekdarê bêdeng serê xwe kir li ber xwe. Camêr jî wekî tu  
tasek ava sar serî bikî, wisa lê hatibû û ji ber xwe ve digot:

Ev çi ye? xewn e yan rastî ye! Casusê çi? Kuştina çi?

Wî xîret bir ber hemû jîrî û taqeta xwe û berê xwe da  
çekdarê yekem û jê re got:

- Birayê min, navê min Camêr Bayiz e. Ez nû ji zîndanê  
derketim, va deh salê min bû, ez girtî bûm. Ez li ser  
kurdîtiyê hatibûm girtin. Jin û kurê min va meh û nîvek  
in çûne gundê Gulan ji bo serîlêdanê, mala xaltiya wê li  
wir e, ez ê herim wan bînim bajêr, êdî ez ne casus im, ne  
masus!

Çekdar, ji wî xortir bûn, ji ber wê, mimkun bû ku navê

151

Camêr Bayiz seh kiribin, Ji bilî vê, li ba wan, eger derew  
ji gotinên wî nedibarîn, kerîtî yan dînîtî jê dibarîn. Lê ev  
yek jî hebû, Camêr gotinên xwe ewqas Ji dil û bi bawerî

digot, herdu çekdarên nêzîkî wî ketin dudiliyek ku ev mirovê han casus nîn e. Qet nebe, nabe casusekî evqas ker be!

Camêr dît ku ev bêdengiya han zêdetir bawerî jê re peyda kir, got:

- Qet gotin jê re naxwaze, hemû bi ser hev, çarîk seet ji vir dûr e, ji bo rastî û derewê, bi min re wer in!

Hê gotina xwe tamam nekiribû, yek ji wan çekdarên jê dûr.jêregot:

- Qet tu mana tê de tune em guhên xwe bidin van gotinên beredayî. Niha, li gor min, tu guman tê de nema ku ev mirovê han casus e. Dibêjin kurd bide xeberdan, şilovekirina xwe bi xwe dike! Dibêje ez girtî bûm û min nû berdane, Ji ber çi berdane? Berdane ku casusiyê Ji dewletê re biîce. Eger çi girtiyek xwenefiroş ê welatparêz heye, dawiya deh salên zîndanê, dewlet wî bişîne vir, di nav cergê şoreşê? Dê yallah, ger em dibin bibin, ger em dikûjin bikûjin!

Hawar bi Camêr ket û qîjiya:

- Babê min, hey di riya Xwedê de, di riya pêxember de, Ji bo çi hûn dê min bêheq û sebeb bikûjin. Ez dibêjim, bi min re werin gund, eger min derew kir wî çaxî min blkûjin. Zarokên min 11 mala Mam Pîrot in, bêşik hûn nas dikin.

Çekdarê yekem bi torebûnek tamam ve çû ser Camêr û gotê:

- Bibre van gotinên kerîtî! Serê te di gora babê wan de be, kerên wek te dişînin ji bo casusiyê. Va ye Gulan mehek e

bi bombaranê kavil kirine, dar li ser keviran nemaye û mala wî Mam Pîrotê ku tu dibêjî, ne tenê mirov, rehek jîndar jî jê nefilitî û laşê kesekî jî jê nehat dîtin. Berê xwe da hevalên xwe, got : Rabin em ê wî bibin qerargehê! Çekdarê yekem hê gotina xwe xelas nekiribû, Camêr ber bi wî ve hat. Evqas ji nişka ve ber bi wî ve çû û xwe lê nêzîk kir, çekdar ketin şikê ku dê ew êrîşê çekdarê diduyan bike ku li ber disekinî. Ji ber vê, yê yekem xwe jê dûr kir, wekî kêçê bilind bû û heta karî qondaxek tiving

152

gîhande navmilê Camêr, tenê bi yek bejna xwe dirêjbûna erdê wî rizgar kir.

Dema hişê Camêr hat serî, pêşî neket bîrê ku li ku ye. Wexta wî xwe tevda navmilê wî test bi arhanê kir, ewçax serpêhatiya wî ket bîrê. Li gel vê jî, bûyer ewqas ne xweş û bitirs bû, xwe bi xwe Jî bawer nedikir ku ka gelo ev bûyera hat serî xewn bû yan heqîqet! "Çawan niha hemû ew hêviyên min di çavgirtinek de ji destê min çûn, Hêwa, Kalê, serbestî, serbilindî jî. Ne ez bawer nakim, ne xelk û ne Xwedê evqas dilkevir bin! Ev tev felaket, dert, bela û kul bi ser hev de, bi yekcarî bikî dijî kesekî tîk û tenê yê yekê bêguneh! Ne ne, ev dtvê yan xewn be yan derew. Lê ji bo çi derew be, ji ber çi armancê, ew çekdar ji min re derew bikin? Ji bo armanca min bidin îşkencê! Lê ne, ew melûlî, sistî û mlîtbûna Lawe jî nîşanên rastiya vê felaketa han bûn. Bêçarê belengaz, wî dizanî çi qewimiye. Lê dilê wî nedigirt ku ji min re bêje. Min Jî pê danîbû ser sitûyan. Bêşik ev sefera dawryê jî her ji ber vê bû ku xwe



ji min dûr bixe, heta wekî xuyaye, serokaniya malwêraniya  
min dizanî! Ji bilî vê, ez tu manayek di hereketên  
Lawe ên ecêb de nabînim. Dema min behsa navê Hêwa dikir,  
rengê wî zer dibû. Neyse, niha ev tev gotin in, ez çi bikim?  
Ez ê xwe çawan ji vî belayî xelas bikim? Wey giyana  
min Hêwa! Babê min çû û birayê min çû!" Qirika wî  
tijî girîn bû. Rûndikên hûr hûr ji çawan dibarî. Ji ber çi  
ew çûn? Ji bo çi ew çûn gund? Mala min wêran kirin.  
Xelk di van têkelhevî û aloziyan de Ji gundan diçin bajaran.  
Bi bextê min ê reş, Kalê ji bajêr diçe gundan. Diçe  
mala xaltiya xwe. Mala xaltiya te kaviil be, wek çawan  
kaviil bû. Dibêjin laşê kesekî nehatiye dîtin! Off Xwedê,  
niha gora wan Jî tune ku ez herim ser û têr û têr rûndikan  
birêjim. Bi Xwedê mirinek nexweş mirin. Wê dema ku ez  
bi xweşî û şahî hatim berdan û gihîştim wan, ew 11 ber  
bomban hatin perçe perçe kirin. Bi rastî dijminek  
bêşeref û bêmerhemet rastî me hatiye. Em Jî bédeng in,  
axir tu bi Xwedê, ev çi şer e! Heta kengî malwêranî? Heta  
kengî bêçaretî? Serê xwe hejand û got: Ne, ez ji gotinên  
153

xwe poşmam im Xwedê! Wisa dixuyê vê felaketa han a ji  
nişka ve ya dilşewitî, hişê min jî serûbin kir. Çawan ez  
di vî şerî de tişteke nîn im? Ma gelo ev nîn e ku Hêwa û  
Kalê tê de çûn? Êê va ye nake ku min jî di nav xwe de,  
mirovekî xerab û nebaş bide nasandin. Ev girtina min  
şerm û sernizmi ye ji bo tevan, çawan dibe min bigrin!  
Min deh salên lawîniya xwe di vê riyê de, di bendîxanê de  
derbaz kiriye. Di çi mezheb û baweriyê de rewa ye ku min

bigrin. Ev zulm e! Tev gunehê van zarokên biçûk in. Ev zarokên han ên biçûk, gulên şoreşê ne, lawên gel in, hêviya rojên bêne. Hêwa can, ez bi ku de diçim, melheza çi tîştî dikim, tu tê ser bîr û hişê min! Kuro çawan, çawan tiştê wiha dibin, çawan zulmekî wiha dike? Nexêr, nexêr, ev tev gotinên vala ne. Çawan dibe ez bi gotina van zarokan bawer bikim? Ew kengî ciyê baweriyê ne, bi taybetî di meselek wiha giran de. Ez ê bi xwe pê wan de herim, eger serê min jî tê de here. ez ê xwe bigihînim bingeha vî karî. Lê eger Xwedê neke, nemabin, ez ê deng û behsên rastî ya mirin û veşartina wan bizanim, ji vê mijmûrana dudiliyê rizgar dibim û bigihîjm hêviya dilek bêhêviyê. Ez bimirim, dayika min digot: riza, rizayê Xwedê ye. Ez riza Jî nebim, çara min çi ye? Her divê ez bêjim riza, Xwedê vê yeka han di qedera min de nivîsandiye! Kes ji destê mirinê xelas nabe, ne xasma yekî wek min bêçare jî! Lê vê girtina neheq ez gêj û şerpeze kirim. Va dinê nû tarî bû. Bêşik êdî kes ber bi min de nayê. Ne, qey ew min di birçiyên nakûjin, her yek dê bê, tiştê ji min re bîne. Ez ê jê re bêjim, min bibe ba mezinê xwe. Li ku dibe bila bibe. Yekî nas bûya baş bû! Dê li ku nasê min hebe? Ez nizanim, kesên di temenê min de mirov dibêje, tev qir ketiye nav wan, mirine, hatine girtin an bazdan çûn. Ew di van cure melhezan de bû, deriyê oda wî vebû. Mirovek ket hindur, nanekî gilover û dulikek avê di destan de bû, Jê re got:

- Min şîva te ji te re aniye. Me tevan vê êvara han nan û çay xwar, tu jî wekî me!

Camêr, hêdî û hinek bi dilşewitî, jê re got:

- Baş e babê min, ji serê me zêde ye. Lê ka tu ji min re bêje, dê kengî pirsiyarê ji min bikin û min berdî? Belkî ez herim tiştêk ji zarokên xwe bizanim. Di riya Xwedê de  
154

hûn dê xêrek bikin, ma hûn ne kurd in?

Kurikê bêyî tiştêk bêje, derket der û derî piştve girt. Te xencerek li Camêr bida, xwîn jê nedihat. Lê çî heye, gelek di ser re derbaz nebû, kurik hat û ji ber derî ve jê re got:

- Min pirsî. dibêjin, pirsê lêkolîna mesela te dê du roj bikêşe, eger heta wî çaxî ew nehat, ew dê te bibin balê. Her neyse, eger tu bêguneh bî, qet bila tirsek ji te re çênebe! Em gelek caran toba gunehkaran jî qebul dikin, em ewqas dilfire ne, Ji ber vê, cezayê te, zêdetir bi te û bi kirinên te ve girêdayî ye!

Wî bi vî awayî got, derî pêve da û çû.

Camêr, di rewşêk ewqas xerab de bû, heta nekarî bersîv jî bidê. Lê bersîva çî? Nedibû meselê di destpêkî de pê re biaxive. Çavê wan birije, çavên min Jî birije, tu dibêjî jîna min diparêz in "... te riya Xwedê de xêran dikir..." 'emrê te nemîne mêrik! Nexêr, pêwîst e ez êdî tîfîlî bikim, çunkî ceza nadin bêgunehan! Wekî ez nezanim ka we xwediye çayxanê yê belengaz çawan bêheq û sebeb girtiye û kiriye zîndanê! Kuro, gunehkar û bêgunehkariya çî? Bi çend sond heye ez bixwim, hemû desthilatdarek li hemberê rastî û feqîrîyê yan korr yan kerr in.

155

16

Piştî du rojan, wan Camêr ji bo lêkolîna mesela wî birin gunrie Navdolan. Her çendîn, di destpêkê de aşkera bû ku ew tundgirtin, birin û anîna Camêr tişteki bêrê û bêcî bû. Lê vê yeka han, di netîcê de tesîrek kir ser jîyana wî ku di wan deh salên zîndanê de jî tesîrek wiha lê nekiribû.

Wexta xwarina nîvroyek dereng bû, ew gihîştin gund. Di rê de Camêr gelek bîhnteng û aciz bû. Çunkî çî kir û nekir, nekarî herdu muhafizên çekdar ên pê re razî bike ku destên wî di pişt de girê nedin. Ji ber vê, di muddetê du-sê seet rêwîtiyê de hewil dida ku di nav tu avahiyên re derbaz nebin û ji Xwedê hêvî dikir ku kesek pê nehese û wan nebîne. Pêlên vê hîsa wî ya han, heta diçû zêde dibû. Lê giran dihat û wî şerm dikir, girtî û destgirêdayê hêzên "L.A.N" be. Di muddetê deh salan de, bi kelepçekirî û mirovên çekdar pê re dibirin û dianîn, lê qet tişteki nedihat bîrê û qet xema wî jî nebû, vê dane ciyek, heta hinek caran serbilind jî dibû ku bi vî awayî di nav boşahiyên xelkê de dibirin. Çunkî ev girtina han, nîşana welatperwerî û mêraniyê bû. Lê ya niha, her çendîn bêheq û sebeb jî bû, lê li ba xelkê nîşana

156

xiyanet û nemerdiyê bû, ji ber vê, lê giran dihat! Beyanek, piştî xwirîniyê, du muriafizan Camêr birin ba hakim. Hakim, kurekî ciwanê sersor û bejinkurt ê qelew bû. Ewqas bi ser hev û bê rawestandî

Camêr da ber gulên topê pirsan, gelek  
nemabû serî lê gêj bike û bi xwe jî tûşî gêjiyê be.  
Li gel vê jî, Camêr her çend kir û xebitî nekarî bi  
wî, piştî deh sal girtin anîna xwe ya ji bajarê "Ç..."  
û di vî navî re derketina wî li bajêr, hatina nav  
navçeyek herî girîng yê şer, bide qebl kirin ku bi  
daxwaz û hêviyeke xerab nebûye. Ji ber vê, hakim  
biryar da, bi girtî bimîne heta ji komîta bajêr bipirse  
û di derheqê aktîvîtên wî de raporek jê re  
bişînin. Ev biryara hakim a derheqê wî de, dest û  
piyên wî sist kirin û ber bi wî de berdan. Camêr  
gelek rica ji hakim kir, dûr û dirêj behsa bêgunehî  
û pakiya xwe jê re kir. Lê dawiyê hakim jê re got:  
- Baş e, tu carek ji derve bisekine da ku ez bikarim  
karê te kurt bikim û bizanim belkî çareyek jê  
re bibînim!

Camêr li ber dîwarek li ser tondikên xwe  
rûniştibû. Muhafizê wî yê çekdar jî li hemberê wî  
sekinîbû. Camêr bi lez destê xwe kir paxila xwe,  
pakêtek cigare derxist û ji muhafiz re got:

- Musaede heye ez cigarek bikêşim.

Muhafizê bi serhejînî jê re got:

- Tu hez dikî sed cigare bikêşe! Eger bi min re  
hebûya min dê jî bida te, lê ez cigarekêş nîn im.

Herdu bi hev re bêdeng bûn. Dinya ber bi germiyê  
ve diçû. Rojê dabû dîwara Camêr li ber dabûn sekinandin  
û siyê lê xelas kiribû, vê yekê mêrikê muhafiz  
jî kiribû tengiyê, ji ber vê, ji Camêr re got:

- Rabe, em ê ciyê xwe biguherin, êdî kêrê rûniştinê nayê. Em herin milê din ber siyê! Camêr bédeng ket pêşî û çûn ber siya milê din. Ji nişka ve muhafîz, ku dixuya ji Camêr baştir guhlê bibû, got:

- Rabe, ez bawer im hakim bangî te dike. Dema ku pirsîn rast bû.

Hakim ji Camêr pirsî:

157

- Tu kesek li bajêr nas dikî ku peywendiya wî bi pêşmerge re hebe?

Camêr hinekî fikirî, fikir ku, bêje, nexêr, ez kesekî nas nakim. Lê ji nişka ve riat bîrê:

- Ez kak Nerîman Hesên nas dikim, min carek dîtîye, ji bilî wî, Aso Memend jî hevalê min e, lê ez nizanim tu peywendiya wan bi şoreşê ve heye yanna.

- Gelek baş e, herdu jî mirovên baş in. Bi taybetî kak Nerîman bi xwe pêşmerge ye. Lê min nebihîstîye peywendiya Aso heye! Baş e, em ê ji kak Nerîman bipirsîn, ez bawer im ciyê wî jî gelek dûr nîn e, ez ê niha bi lez nameyek jê re bişînim. Eger ew te mirovek qenc bizane, ez ê te bê xirûcir berdim. Tu hez dikî ez bêjim bila te neşînin ciyê berê, 11 vir be heta bersîvek tê.

Ev gotinên hakim gelek li Camêr xweş hatin, jê re got:

- Ez gelek spas dikim, tu çawan baş dizanî wisa

bike. Belkî tu bikî zû bersîv bê!

- Hema niha, ez ê bi namebirek taybetî re bişînim, ger çendîn mirovek baş e û ji wan kesan nîn e karê îro bihêle sibê, lê ez ê rica jî jê bikim ku zû bersîv bide!

Du roj bi ser re derbaz bûn. Êvarek, muhafiz hatin û Camêr birin ba hakim, hakim bi rûyekî xweş jê re got:

- Mizgîniya min li te, kak Nerîman bi xwe bersîv aniyê û hatiye serîlêdana te. Tu ji niha ve azad î, tu ku ve dixwazî dikarî biçî. Bêşik, gelek tu li me jî biborî, em naçar in di riya parastina şoreşê de van cure kirinan bikin û car û caman jî bikevin şaşîtiyan. Netîca derbazbûna mirovên xerab ewqas bi tirs û zerar e, dilê me razî nabe û em nikarin wê destûrê cîbicîh bikin ku dibêje: "tu neh gunehkaran berdî baştir e ji wê ku tu bêgunehk bigrî".

Lê ji vê yekê jî dilgerm be ku em destûrê nagirin  
158

li ber çav ku "neh bêgunehan bigrin ji bo ku gunehkarek derbaz nebe!".

Demek dirêj ew bêdeng sekinîn. Camêr fikra wê yekê dikir ku berdane û belkî bikeve rê û here Gulan. Lê li gor gotina muhafizê, ew navçe gelek ciyê tirsê ye. Xelk ji tirsê firokan, bi şev ji gundek diçin gundekî din. Rê jî niha hê dûr bû, hemû şev bê meşandin nîvê rê xelas nabe. "Ez nizanim Xwedê li we çi bike, bêheq û sebeb we min ji riya min

dûr xist, ewqas nemabû ez bigihîjmê. Ez ê biçûma  
û min dê bi çavên serê xwe malwêraniya xwe  
bidîta, ji du kesan bipirsiya, min dê bi du havderdên  
xwe re xeberda û xemên xwe bida ber bayê..."

Di vir de, Nerîman Hesên ket hindûr û wekî dostekî  
gelek nêzîk û hevîskirî, destê xwe kir milê  
Camêr û vî milî û wî milî yekûdu maçî kirin û jê  
re got:

- Ez nehatime hal û kêfa te bipirsim. Ez hatime li  
ser navê Komîta Serokatiya Şoreşê daxwaza lêborînê  
ji te bikim! Li tevan gelek giran û ne xweş  
hat, dema bihîstin lawekî wek te, di ciyê rêzgirtin  
ji aliyê pêşmerge ve. te tûşî eziyetê kirine!

Nerîman wiha got û milê Camêr girt, wek bi van  
xeberên xweş temamê wan serpêhatiyên wî ji bîr  
biribe, bir ciyê ku li wir dima. Di rê de jê re got:

- Em herin mnekî biaxivin, bi hev re şîv Jî bixwin  
û li ba min jî rakeve, ma qey niyeta te bi ciyek ve  
heye?

Camêr xwest jê re bêje, eger îzna wî hebe, ew  
diwxaze biçê gundê Gufan, lê xwe girt û gotê:

- Ne bi Xwedê, berê min li ciyekê bû, lêbelê...

Nerîman gotê:

- Lêbelê û mêbelê jê re naxwaze, em ê îşev bi hev  
re li vir bin. Tarî ye û şev e, daxwaza te ji bo vegera  
bajêr jî hebe, tu nikarî rê derbixî. Em ê îşev  
rakevin û pişt re ez ê vegerim ciyê xwe û tu jî ku  
ve diçî here. Lê tu agahê xwe bî, bi tu awayê xwe



nêzîkî karwanan meke! Heta tu dikarî ji rê dûr bimeşe.

Camêr, gotinên wî yên gelek bi cî, bi lutf û rêz, ji

159

xwe re zêde dît, ji ber vê naçarî pê re çû. Camêr di dilê xwe de digot: belkî em bikarin tişteke bixwin, qore qora rûviyên me bisekine, nan û çayê em kuştin. Mala benîadem kavi be, çiqas zîhîn kor e! Panzdeh-bîst rojên xwarina baş ên mala Lawe yê mamê min, ava qirêj a deh salên bendîxanê ji bîra min biriye. Niha jî ez ji destê nan-çayê bêzar im! Tu dibêjî, min tucarî nanê zîndanê nexwariye, di nav wan xwarinên ji me re dianîn de, mêş, qirş û qalan nebijartiye. Di vî navî re. Kalê û Hêwa ketin bîrê, çizîn ji dilê wî hat. Nerîman ji destşoştinê vegeriya, jê re got: "Her çendî şîva me pêwîstê destşuştinê nîn e, tenê nan û çay e, lê eger tu dixwazî dikarî biçî destê xwe bişûyî!"

Piştî nanxwarinê, cardin Nerîman hat ser behsa girtina Camêr û daxwaza lêborînê, piştî gotinên xwe wiha domand:

- Ya rast, di milekî de heqê hevalên me jî heye, van cure kirinan bikin û çî kesî nas nekin bigrin. Meha berê mirovek ê jê re Seydî Şal Kesk tê gotin, tê gundê Gulan, di wî navî re şeş-heft çekdar ji bo karekî li wir in. Li gor baweriya wan ew casus bûye. Dema vedigere, ji dewletê re dibêje, gundê Gulan bingeha pêşmergan e. Wan jî berî beyanek

şeş firoke şandin ser xelkê bêguneh ên gund, ji bilî ew kesên di avahiyên de yan li çiyên bûn, kesek jê xelas nebû. Belê netîca kêmtêrxemiyê ev e!...

Dema Nerîman ev gotin digotin, rûyê Camêr ku li hemberê wî rûniştibû, zer bû û hemû laşê wî lerizî. Nerîman bi mereq jê pirsî:

- Ev çi ye kekê Camêr? Ez dibînim rengê te biziriye, ev çi ye, xêr e, tu nesax î?

Camêr bi dengê nizm û melûl ve gotê:

- Ne rehê min, tiştê min tune, tenê xem û kulên min ên berê ketin bîra min!

- Kîjan kul û xem? Belê! Kuştina wan nehêd û sê kesên bêguneh! Bi rastî, Ji bo hemû kesek xem û kulek mezin bû!

Camêr wek ji ber xwe ve biaxive, got:

160

- Belê ji vê xem û kulê mezintir çi heye, bi taybetî ku Ji bo min, hem xem û kulek gelemperî û taybetîjîbû!

- Ji ber çi kekê. kesek te tê de hat kuştin, tu mirovên te li wir hebûn?

Camêr, fikir demarê kerîtiyê bigre. bersîv nedê û rabe here. Çawan dibê ku Nerîman nizane Hêwa û Kalê li wî gundî bûn û li gel wî xelkî hatine kuştin? Çawan dizane nehêdû sê kes bûn û nizane. Hêwa yê jîyana wî bi xwe di nav wan de bû?

Qasî çavkotanek xwe ji vê fikr û nêrîna kerîtiyê xelas kir. Ji xwe bi xwe dipirsî: Nerîman dê çi bizane

Hêwa û Kalê kî ne? Ew ji ku min nas dike.  
ew hê zarokê do ye. Dema min kurdîti dikir. mimkun  
eewhê di sinifa sisiyan an çaran a dibistana  
destpêkê de bû. Hemû li ser nasîna me ya bi hev,  
hê panzdeh roj derbaz nebûne, berî ku Aso di  
çayxana Bextiyar de me bi hev bide nasîn, ne min  
dizanî Nerîman Hesenek di dinê de heye û ne Jî  
wî Camêrî nas dikir. Êdî ez ê çî gilî û gazinde jê  
bikim. Piştî demek, Nerîman bi rêz ve çaveriya  
girtina vê meselê dikir. Çunkî sebebê van kul û  
xeman dizanî, Camêr jê re gotê:

- Kurê min ê tekane, jina min, birek xizm û pismamên  
min tê de hatin kuştin.

Nerîman bi xem û wek tu daxek li ser dilê wî bidî,  
bi ser hev de çû û jê pirsî:

- Kur û maliya te? Bi rastî? Weyş mala min wêran  
be. Dibû te nehişta ew bêne nav vî agirî!

Camêr nefesek kêşa û gotê:

- Ez î xwêlîser li ku bûm heta ku bihêlim an nehêlim!

Ez di zîndanê de bûm, min rojên dawiyê yên  
deh sal girtina xwe derbaz dikir! Vêca eger ew  
bêkes û derbeder nebûna. çima riya wan dê biketa  
vir û ji ber çî, bi vî awayî bihata serê wan?

Nerîman bi awakî xemgîr gotê:

- Ez bawer im, çavên te jî bi wan neket!

Çavên Camêr tijî rûndik bûn. Qulpên girînê gewriya  
wî girtin. Di ciyê bersîvdanê de serê xwe he-  
Jand. Hat bi bîra wî ku li hemberê wê rêzgirtina

Nerîman a zêde, gerek e xwe ragire. Baş nîn e li ber çavên wî bigrî, Ji ber vê, bi hêz û quwetek pehlewani ve xwe girt û gotê:

- Ew jî wek wan dehan hezarên din ku hemû ji xwediyan xwe re Hêwa û Kalêya xwe bûn û xwedî kes û kûs bûn!

Ev gotinên han, tesîrek gelek baş li ser Nerîman kir, bi dilekî şewitî wî serê xwe hejand û gotê:

- Ji vî karî re ax û wax naxwaze, tu çi dibêjî? Ev şoreş e, ter û hişk bi hev re dişewitin!

Camêr vê yekê fîrset zanî ku hinekî xem û kulên dilê xwe birêje, ji ber vê, got:

- Ev yeka han, li gor min Ji tevan nexweştir e, bi rastî di vir de ji heddê xwe derketiye! Kuştina van bêgunehên nan, wêrankirina van mal û xaniyan û şewitandina deşt û zevîyan, wisa dike ku xelk bêzar bibin! Zûlm e, ter û hişk bi hev re bişewitin.

Xwezî we tiştêk wisa bikira, hinekî van derd, êş û eziyetên xelkê kêmkirana. Ya rast be, dilê min bi yê ter dişewite ku ji bo hişkan tîn şewitandin.

Nerîman, gelek bi nerm û aram gotê:

- Xwezî tiştêkî wiha di daxilê îmkanên me de bûna û me bikira! Lê mixabin di daxilê îmkanê me de nîn e. Yê ter û hişk bi hev re dişewitînin, em nîn in, dijminê me ye. Ev rejîma han a zordarê zalim a xwînmij e. Em ne xwediyan firokan in û ne jî ya topan! Van tev malwêranî û ter û hişk bi hev re

şewitandin jî bi firoke û topan dikin! Tu dibêjî,  
heyfa min tenê bi terên bêguneh tê, lê heyfa min,  
bi ter û hişkan bi hev re tê. Ez van herduyan jî  
bêguneh û layîqî jiyaneke azadane ya dilxweş, serbilind  
û xweşiyê dizanim. Lê dijminê xwedî desthilat  
ê xwînwar, herduyan jî layîqî mirin, şewat  
û zulmê dihesibîne. Mîmkun e hinek kes bêjin,  
axir hûn li dijî wan rabûne û li hemberî wan derdikevin,  
ew jî wiha dikin! Carek ew ên van gotinên  
han dikin, ji bîr dikin ku em li ku û ji ber çi li dijî  
wan rabûne û li hemberî wan derdikevin. Em di  
welatê xwe de, ku wan ji me dagîr kirine, ji bo  
desbdstina mafên xwe yê neteweyî, demokratîk û  
162

mirovayetiye, ku wan me jê bêpar kirine, di riya  
azadî, rizgariya gel û welatê xwe de li dijî wan  
rabûne û li hembêrî wan radiwestin. Ji ber vê, li  
gor min çi kesek van tuhmetan bike, bixwaze yan  
nexwaze, layengiriyek temam ji bo vê rejîma han  
dike ku pîstirîn û nizimtirîn seviyek perçiqandin,  
şelandin û zorlêkirinê, hukum li xelkê me dike.  
Vê dane ciyek, wî ne tenê ji azadî û serxwebûniya  
wî pêpar kiriye, hetta ji jiyaneke mirovayetiye û nanek  
merdane jî bêpar kirine. Reben û belengaz,  
birçî û paşdemayî, nexweş, nezan û bindest. Eger  
mirov li hemberî tev van zulm û zoriyan bêdeng  
bibe, çawan dikare bibe însan? Eger, li ba yekî ev  
jiyana han a sernizm û heywanî, ji mirineke merdane

ya di riya jiyaneke mirovane de baştir be,  
divê çî be? Min got heywanî, ger çendîn heywan li  
ber destê xwediyê xwe gelek ji me nazdartir e.  
Çunkî bi mirina wî, pere Ji kîsê xwediyê wî diçe,  
ji ber vê jî xizmetê Jê re dfike. Lê em di cehennemê  
de dimrin û bi menzereyek din tîn ber çav. Ji  
ber vê, hemû bîr û baweriyên pêşkevî yên dinê,  
hemû dîn û ayinek asîmanên bilind, hemû exlaq û  
tebîetek însanî û camêrî di rabûn û li hember derketina  
dijî zulm, zordestî, xwînmijandin û eziyetê,  
ya di riya azadî, pêşkevî, rizgarî û serbilindiyê  
de, hender û alîkarvanê me ne.

Camêr ji hêdîka ve gotê:

- Madem wiha ye, li gor bawerîya te, tu wextê  
dawiya van kuştin-kuştarî, wêranî û belengazî,  
derd û eziyet. ter û hişk bi hev re şewitandin, nîn  
e?

- Dawîpêhatina van, li gel dawîpêhatina zordarî û  
eziyetê ye. Çunkî ev tev hemû, yan kirin an berên  
kirinên zordar û dagîrkeran in.

Camêr, bi armanca dawî bi axaftinê bîne, gotê:

- Madem wiha ye, Xwedê ji aliyê xwe de rehmek ji  
bo vî xelkî bişîne û rizgar bike, heger tev dê di bin  
dest û piyan de fewitin û biçin!

Nerîman serê xwe hejand û nefesek kêşa û gotê:

- Ez ditirsim bêjim ku ev ji curek cihêkirinê ne-

163

hatiye. bi şoreşê ve girêdaye. Heta şoreş di dinê de

bimîne, ev halê han jî dê di dinê de bimîne, heta  
zulm, zorî û eziyet hebe, pêwîst e şoreş bibe, bi bê  
guhdana qîmet di riya jiyaneke nû, di riya azadî û  
serbilindiyê de, divê riemû tişteke kêr û hemû  
qîmetek bi erzan bête pêş çav. Ew roja wiha nebe,  
bizane ku mirovayetî mir, bêje, zordar xweş be!  
Bêje, civak tûşî sitewriyek bûye û dilî, feqîrî û  
paşdemayin ciyê xwe girtiye. Lê wî çaxî jî şoreş  
her dê hilkeve, lê paş dikeve û çiqas paş bikeve,  
qîmeta wê girantir dibe û piraniya fedakariyê jî li  
ser gel disekine. Di hinek qonaxên dîroka civakî  
de, şoreş dibe tişteke pêwîst û fermaneke naçarî.  
Çunkî şoreş nebe, zulm. zorî û eziyet ji holê ranabin.  
Di saya şoreş de nebe, qeyd û zincîrên dest,  
mil û hişê civakên xelkê nayên çirandin. Şoreş  
jana gel e. Navê lanê bi xwe li ser lanê ye, çî ya 1i- nan be, çî ya gel  
Ji ber vê. tişteke ecêb nîn e ku  
jana gelek pir derd, eziyet, xwîdan, rûndik û xwîn  
be, ev wiha ye. Lê gelo tu şik di wê de heye ku hatina  
dinê yê neteweyek aza yê serbilindê bextiyar,  
janek ji wê hê eziyet û nexweştir bi xwe re tîne?  
Camêr, di destpêkê de ku bi gelek dîqqet guhên  
xwe dabûn gotinên Nerîman, di van gotinên dawiyê  
de qet agahê wî jê tune bû, veqerabû wext û  
ciyekî din. Wek ev gotinên han bibin destekî nenênî  
û xwe deynin ser kopikên bîranînên wî, yan  
fîlmeke kevn anîbe ser perda hişê wî. Xwe û Kalê  
gelek bi rind anî ber çavên xwe. Ew di nav ciyan

de di destê janê de digeviziya û ew jî di odê de ketibû çûn û hatinek bi lez, wek bazdanê. Wî dixwest tiştê bike, çî tişt dibe û bi çî bihayê li ser rûne, Ji bo ku hinekî eziyeta Kalê kêmbike. Lê qet di wê rewşê de nebû. Ji kerb û daxa bêdesthilatîyê gir qîjîn û gotê:

- Bi rastî, ev eziyet û êşa han a bêsinor heta tu bêjî tiştê nerewa û bêcih e.

Kalê jî ewqas bêtaqet bû, tirş û taliya çara wê ya tejî bi eziyet, wê ji xew hîşyar kir, bi dengê wek çirpîn gotê:

164

- Ne giyana min, wiha nebêje! nabe tu wiha bi zû ber bi şaşîyê de biçî. hatina însanekî 11 dinê, gelek ji vê jî zêdetir jan hildigire!

Ji ber xwe ve got:

- Belê rast e, hatina însanek li dinê gelek ji vê jan û eziyetê Jî zêdetir jan hildigire. Lê daxa dilê min, bêyî ku bikare feyde jê bigre, jan kêşana wê û hatina dinê jî hemû beyhûde çûn. Mirina bêeman, kon û xêwetê wê da hev.

Camêr ku bi melhezên xwe ve gihîşt vir, êdî ferqa cihêkirina dem û ciyê kesekî li balê nema.

Bîranînên rojên borî û yên halîhazir tê de dijiya, têkelê nav yekûdu bûn. Destek veşartî, gelek bi hovîti dilê wî givaşt, xemeke tal a bi eziyet xwe berda ser çara wî. Pirsek, hemû hiş, cîh û dinya wî wek sawmtirîn dêw li ber çavên wî qut kir. Kî



dibêje, jana gel jî wek ya Kalê nabe? Çawan dizane  
tev ev qurban, êş û eziyeta xelkê jî beyhude naçe?  
Çawan wê mirina zorkeran Jan û berê jana wê jî  
perçe perçe kir û gorek teng û tarî jî Ji wan re  
rewa nedît, niha jî zordarek nû bi postê rizgarkeran,  
gel û berê jan û eziyeta wî, ji bo destkevtiyên  
xwe û der û dorên xwe. ji nû decivakên xelkê bi  
navekî nû û bi davikek nû ve neavêjin nav cehennemek  
ji carên din hîn nexweştir?

Camêr, di van melhezan û sawman de bû. Nerîman  
di naverek re wek ku tiştê li dilê wî gerabe û bizane  
ew melheza çi dike yan jî netîca axaftinên wî  
wisa anî, ji Camêr re got:

- Vêca, bêguman şoreşek ku bi van hemû êş, eziyet,  
zulm, xwîn, xwîdan û rûndikan ve li ser xelkekî  
rûne, pêwîst e xelk jî ji ronahiya çavê xwe  
baştir berê wê biparêze. Her wek dayikek dilsoz  
çawan kezeba dil û berê jana xwe diparêze!  
Camêr dema ku çarenivîsa kurê wî Hêwa hat bîrê,  
bi hêdîka ve got:

- Bi Xwedê bira, baş karî biparêze!

Nerîman, ne ji ber wê bû, ku hay û gumanê wî bi  
tiştêkî wisa hebû, her wek xebatkerekî xwedî bîr  
û baweriyek bi xurt, gotê:

165

- Belê, bila qet guman di wê de nebe ku eger gel  
hîşyarî, îmkan û taqeta xwe ya bêbinî û bêsînor bi  
baş û rêk û pêkî, hîs û daxwaza xwe ya şoreşgerî bi

awakî demokratîk bi kar bîne û fermana parastina berê şoreşê bigre ser milê xwe, gelek baş dikare vê erka han a girîng bibe serî, ku li gor baweriya min ji şoreşa wî bi qîmettir nebe kêmtir jî nîn e. Û qet şik jî di wê de nîn e, xelk dê netîca vê xebatê de bi ser keve.

Dawiyê, di navbera rûniştin û axaftinê de hinekî bêdeng bûn. Nerîman bawîşkek da, Camêr hilda û gotê:

- Madem em ê demek zû bikevin rê, ya baştir ew e em rakevin.

Nerîman gotê:

- Tu rast dibêjî, ya baştir ew e em rakevin. Xew, baştirîn xwe jibîrkin e... erê bi rastî, min Ji te nepirsî, daxwaza te ber bi ku ve ye... bajêr?

- Nexêr, ez dixwazim biçim gundê Gulan!

Nerîman, serê xwe hejand û ji nerm ve gotê:

- Gulana çi kekê min! Jîndarek di Gulanê de nema ye. Tu biçî wir çi bikî? Ji bilî vê, niha şer ketiye wê navçê, roj nîn e sê-çar car rê û gundên wê navçê neyên bombaran kirin!

Camêr di dilê xwe de got: bira di cehennemê de bê bombaran kirin, Xwedê bike perçekî bombê, perê dilê min bigre û ez pê rizgar nebim. Berê xwe da Nerîman û gotê:

- Li gor qeneeta min, çûna min baştir e, yê van dawiyên bi serê min de hatin, ji tu bûyerekî yê di vê dinê de qewimîn, kêmtir nîn e!

Nerîman bi tebessumek gelek şewqet ve gotê:

- Li min bibore, lê ez di vî warî de bi te re nîn im.

Yekî wek te niha jî, bi ser toşbûna van eziyet û astengan  
de jî, xwedî ciyekî taybetî, kar û fermaneke  
aşkera nebû û heye jî!

Camêr bi armanca Nerîman gihîşt, lê xwe li nezanînê  
danî. Hat bi bîra wî jî ku mimkun e rûyê

Nerîman negirtiye Jê re bêje, li navçên şer de  
gerîn qedexe ye û careke din bê girtin û tûşî

166

serêşiyek din bibe. Ji bilî vê, çûna Gulan dê çi feydek  
bidê ku kevir li ser kevirê nemabe? Ji ber vê,  
gotê:

- Baş e, 11 ser gotina te ez naçim Gulanê, ez ê  
vegerim bajêr.

167

17

Dema Camêr vegeriya mala Lawe, wî jina Lawe  
madekirî dît. Ji wê tirs ku mêrê wê di ciyê wî de  
girtibin. Her çendîn bi qanunî li hemberê hukümetê  
tu peywendiyek wî bi Camêr re tune bû, lê  
qanûn û manûn tune bûn. Tişteke hêsan bû, pismam,  
xizim, kes û kûsê yekî ku wî bi mêvandarî  
hewandibe, di ciyê mêvanê xwe de bê girtin. Bi  
awakî şerm û tirs ve, hevala Lawe jê re got:

- Sê roj berî niha ew vegeriya bajarê "H...", dema  
dît tu wenda yî, wî jî xwe veşart û heta bizane ka  
dê çi li mesela te bike. Eqil di biçûktî û mezintiyê

de nîn e kek Camêr. nedibû tu bi vî awayî bê ser û  
şûn xwe wenda bikî!

Çavên Camêr tejî rûndik bûn, zerayê rûyê wî girt û  
laşê wî lerizîn, xwest biaxive, lê girînê pêşiya gewriya  
wî girt, serê xwe xwar kir û bédeng berê xwe  
da wê oda ku dabûnê. Derî bi ser xwe de girt, xwe  
avêt ser ciyê xwe, ket girînê. Hemû wan rûndikên  
bêperwa rijand ku heşt-neh roj bûn ji tirsana nahezî  
û Ji şerma dostan^ bi hêzeke azayetî ve pêşî lê girtibû.  
Ev gilî û gazindên jina Lawe ya biheq û tûj,  
taqetê jê birî û çengên wî şikandin. di wî hal û  
rewşê de nema, êdî zêdetir xwe lê bigre.

Jina Lawe xeberê hatina Camêr, şîna û girîna wî  
gîhand Lawe, ew jî ji ciyê xwe yê veşartî derket  
168

der. Dema ew vegeriya mal û çavên wî bi Camêr  
ketin, qet neda rûyê wî. Bi xweşî û jina wî jî ku  
agahdariya wê bi rewşê hebû, zanîn ku sebebê şîna  
û xema Camêr ew e ku bi nemana jin û kurê xwe  
hesiyaye, lê nedizanîn, li ku û çawan pê zaniye.  
Êvarê, Lawe mase li oda Camêr raxist. Ev raxistin  
û haziriya sofrê, zêdetir jî ji bo xwe bû, ku va çend  
êvarek bû venexwaribû. Dema ew rûniştin, wî  
qedehêk danî ber Camêr jî. Ew ma ecêbmayî, Camêr  
qet xeber neda. Wi wisa zanî ku haya wî lê  
nebûye, qedeha wî bir û jê re dagirt, lê hê bédeng  
bû. Vêca jê re got:

- Ji xwe re avê têkê!

Camêr Jî bêdeng hinekî av têkirê û hilda serê xwe.  
 Nîv seet zêde ser rûniştina wan re derbaz bû, Camêr  
 bêdeng û qedeh bi ser qedehê vedixwar.  
 Lawe jî di nav xem û kuleke kûr de xwe bêdeng  
 kiribû, zêdetir jî ji ber wê bû. ku nedizanî ka gelo  
 dê çi bêje û ji ku ve dest pê bike! Ji ber vê, desthilata  
 bêdengiyê rahejand û dûra dest pê kirina  
 axaftinê hîşt hêviya Camêr. Ew jî, wisa dixuya heta  
 dihat barê matî û kederê li ser mejiyê wî giran  
 dibû, ji ber vê, çavên xwe kiribûn erdê tenê dema  
 qedeh hildanê bilind dikir. Taqet di Lawe de  
 nema bû, rabû û çû oda din ba zarokên xwe. Bi qasekî  
 şûn de ew vegeheriya. Wek ji ketina hindûr bitirse  
 şîna odê zêde bike, wî Ji derî de got:  
 - Rabe Camêr! dê ka îro jî em li oda nanxwarinê  
 şîva xwe bixwin, wisa dixuyê dayika Dara me mêvan  
 hesêb dike, xwarinê xweş jî ji me re daniye.  
 Şîva me koftê sabunkeran a ku tu jê hezdikî ye.  
 Lawe, gelek baş dizanî, axaftina wî dimîne pêkenîna  
 girîna şînê, lê vê yekê ji wê baştir zanî ku  
 bê şîv rûnin û carek ji nû de her tiştî nû bikin. Camêr  
 bi madekirî gotê:  
 - Destê wê xweş be, temenê kurê wê dirêj be... ji  
 bo nanxwarinê hê zû ye. Were tu dilopek areq ji  
 min re bîne û rûne em hinekî biaxivin.  
 Lawe bi ecêbmayî jê re got:  
 - Areq! Va ye nîv qedeh li ber te nîn e?

Camêr bi awakî şermokî, jê re got:

- Tê de nema yel

Lawe, bi lez, bi ecêbmayineke veşartî û bi rûyekî xweş ve, nîv şoşeyeke din anî û danî ber û got:

- Fermo, eva areq û va ez jî rûniştim!...

Hê şoşe baş li ser masê ciyê xwe negirtibû, Camêr bi lez destê xwe avêtê û qedehek mezin ji xwe re dagirt. Lawe jî bi tebessum qedeha xwe bir pêş ve û gotê:

- Hinek jî ji min re!

Lawe dema qedexê bir devê xwe, ji wê poşmam bû ku xwe kir bin qemçiya Camêr. Baştir ew bû ku firseta şax dakutanê nedayê. Wekî tişteki ji axaftina xwe bikeve tirsê. Di dilê xwe de digot: dibû min bang bikira û bûyerê bi xwe jê re bigota û firsetê nedayê heta ji hinekên din seh bike. Niha Xwedê dizane, çawan û çî jê re gotine. Min şaşîti kir, min wisa dizanî, ez çiqas bi tundî jê veşêrim û derengtir rastiyê bizane, ji wî re baştir e. Ez li hêviya wê jî bûm ku hê bi awakî baştir jê re bêjim, min hezar û yek car bûyerê li ber hişê xwe re derbaz kir, ez li ser fikirîm, min pîva û danî, lê bi kêrî tişteki nehat. Ev şaşîti bi destê min bi xwe çêbû û netîca wê jî ev e!

Dengê Camêr ew hîşyar kir ku jê re got:

- Ev çî ye Lawe? Ji ber çî destê te bi şoşa te ve hişk bûye? Ez nizanim, ez ê çawan dest bi axaftina xwe bikim... bi rastî Lawe, ez li hemberê te

şermezar im. Bêheq û bêsebeb, bi nezanî min eziyet  
û zehmet da te, ji ber ku ewqas bi sawm û bi  
elem bû, dilê te Jî riilnedigirt ku tu rastiye ji min  
re bêjî! Min dît, dema behsa zarokên min li ba te  
tê kirin, bi yekcarî rengê te zer dibû. Bêşik te dizanî  
gundê Gulan kavi kirine û kesek jê xelas  
nebûye û wek hemû xelkên wî gundê, Hêwa û Kalêya  
min jî perçe perçe bûne! Tuf dê mirov çi ji  
karê Xwedê bike?

Lawe, niha jî dema Camêr behsa Kalê û Hêwa jê re  
dikir, zerayê rengê wî digirt, bêhîs û deng çavên  
wî diketin ber, mat û melûl dibû. Wî dizanî, hewce  
170

ye ew jî bi xwe û çend gotinekê bêje. Bêyî di bîra  
wî de be, hindik mabû ew têkeve nav meselê û  
dilê xwe Jê rehet bike. Baş bû ku ber bi hişê xwe  
de hat û sekinî. Vî carî jî Xwedê jê re li hev anî,  
Camêr bi xwe dest axaftinê kir:

- Êdî ev behsa han bes e! Carek din ez dilê tu kesî  
bi nav hilanîna wan aciz nakim. Tenê heqê wan li  
ser min heye, heta ez li ser rûyê dinê sax bim,  
navê wan ji bîr nekim. Belê, vêca em bîr ser  
meselên dinê. Kekê min, bi vî awayî nabe, ez wek  
darbestek li ser milê te bimînîm, divê ez karekî  
bikim!

Lawe, nehîşt ev firseta han ji destan bireve, bi  
şermokî jê re got:

- Tu bi Xwedê eger tu gotinên wiha bikî Camêr!

Camêr bi nerm, gotê:

- Gelek sipas. tu min didî şermê. bêguman camêriya te gelek e li ser min, lê ji vê re gotin naxwaze, li min bi xwe jî gelek nexweş tê ez bi vî awayî bêkesp û kar bisekinim. Nefesek kêşa. Ez nizanim ez ê çi jî bikim? Memurayetî, ji xwe ew qet, ji vî seetî şûn de ne dewlet min dixwaze û ne jî ez ji wan re memurayetî dikim. Hemû karekî din jî sermaye dixwaze. Ez dizanim ku tu nikarî sermaye ji min re peyda bikî û heqê min jî tune ku ji te re bêjim, peyda bike. Eger hetta tu di wê rewşê de jî bî, çunkî karê min xaniyê ser şîvê ye. Heq nîn e li ser van tev camêrî û qencyên te. ez te tûşî sernizmî û deynan bikim. Tenê riyeke min heye!

Lawe hilda û gotê:

- Tu çi dibêjî. em bi hev re kar bikin?

Camêr, zanî Lawe van gotinan ji dil û merdane dike û qet lêkolîn jê re naxwaze, Ji ber vê gotê:

- Ne kekê min, ez vê jî bi te re nakim û gelek jî sipas dikim. Ez ê riya xwe ji te re bêjim. Tapuya xaniyê min li ser babê min e, her çendîn kavi jî kirine, lê ez dikarim ciyê wî bifroşim û bikim sermaye.

Ev, ji bo dev ji min berdan û serkevtina min, baştir e. Jixwe eger ez bi ser nekevim an

171

bêm girtin, bira ev neh jî li ser wî dehî be! Vêca tu çi dibêjî?



Piştî demekê, Lawe got:

- Baş e, tu çiqas sermaye dixwazî, bêje, belkî ez ji te re peyda bikim?

- Min ji te re got kekê min, min sermaye te navê, ez şer û belayê xwe ji te dûr dixim. Guneh e ez te jî bi xwe re bişewitînim, zarokên te biçûk in. Wisa dixuyê yekekî nû jî bi rê de ye! Ji bilî vê, min te ji tiştêkî din re hildaye, carek bila wexta wî bê, ez ê ji te re bêjim. Ka tu ji min re bêje, kavila min çiqas dike?

Lawe hinekî fikirî û gotê:

- Niha, ji ber sebebê asayîş û şerê, milk hinek şikestine, li gel vê jî, erdê te li ciyekî baş e, mimkun e mêtroçargoşa wî çar-pênc dînar bike. Çend mêtro ye?

- Ez nizanim. Lê nêzîkî sêsed mêtroyan e.

- Ê baş e, em ê tiştêk lê bikin. Lê te ji min re negot ka tu dê çi jê bikî!

Camêr bê lam û cîm jê re got:

- Kitêbxane!

Lawe serê xwe hejand û jê re got:

- Di rojêke wiha de dibê kespek xerab nebe. Lê ez bawer nakim rojêk wiha li vî bajarî mirov pê bijî, çunkî hetta gelek ew kitêbên li paytext jî hatine çapkirin, li vir qedexe ne û xelk pê tîn girtin! Vêca kitêbên din. Bi ser van tevan de, ez bawer im mûsaede divê!

- Min fikra hemû aliyan kiriye. Li gel vê jî, başiya

wê ji xerabiya wê zêdetir e. Hatina wê her çendîn kêm jî be, yekî wek min bi serê xwe, dikare pê bijî! Têra naneziya min bike, bes e!

Lawe, qasek bêdeng bû, piştî gotê:

- Ya rast ez ewqas pê nizanim. Lê eger li ba te baş be, li ba min jî baş e! Lê musaede dê çawan be?

Camêr gotê:

- Tu dest lê mede, ew 11 ser min. Tu tenê du tiştan ji min re bike, yek, bikirek ji min re peyda bike. Duyemjî...

172

Lawe gotê:

- Êê... duyem jî... dê temam bike, tu çi dixwazî, ez bikim?

Camêr, her çendîn baş vexwaribû û hê jî vedixwar, lê cardin bi şermokî jê re got:

- Bi deyn pêncî dînanan bide min û heta ez mulkê xwe difroşim.

- Tu bi Xwedê Camêr, van gotinên beredayî meke!

Lawe bi vî awayî got û destê xwe bir cêba xwe. Camêr gotê:

- Barek baş e!

Vê got û destê xwe bir peran jê sitend, danî ser masê û jê re got:

- Lê bi birayetiya me, te çawan daye min. bi wî awayî jî ji min wernegirî, ez ê li ber çavên te perçe perçe bikim. Di van deh salan de her mehê te du dînar ji min re şandin û zarokên min jî 1i

min re xwedî kirin. Di vir de gotinên wî wek cfi gewriya wî de bimîne, bêdeng bû, qedeha xwe girt û hilda serê xwe. Piştî demek baş, nefesek kêşa û rabû ser piyan û got:

- Ka em biçin şîva xwe bixwin.

Lawe jî bêdeng riya oda nanxwarinê girt, li wir Jî wan bêdeng nanê xwe xwarin. Camêr, piştî nanxwarinê serê xwe bi aliyê oda rûniştinê ve dirêj kir û bi dengekî hinek bilind got: Destê te xweş be dayîka Dara, bi rastî koftên te gelek xweş bûn, wekî hemû xwarinên te.

Dema hatin oda Camêr, Lawe jê re got:

- Ji te re çay anîne, tu çi dibêjî?

Camêr gotê:

- Nexêr, îşev ez venaxwim. Destê xwe avêt qedeha xwe dagirt û qurtek baş lê da. Lawe dengê xwe nekir. Di dilê xwe de got: Heqê wî heye, niha ew dê serxweş be û bêhiş bikeve heta beyanê, ev ji wê baştir e heta roj bilind be di nav ciyan de xwe bigevêze! Bi vî awayî bêdeng rûniştin. Camêr vedixwar û cigare bi cigarê vêdbdst, Lawe jî bê sebir bi tizbiyên xwe ya kehrebar dilîst. Ji nişkave rabû ser piyan û

173

got:

- Xewa min tê, ez ê biçim rakevim, bizanim ka belkî ez beyanê bikirekî baş ji bo xaniyê te peyda bikim, şev baş!

- Şev baş! Xwedê bi te re be.

Serê sibê dema Camêr Ji bo mesela tapuya ciyê xaniyê  
xwe çû, jê re derket, ku ew hiciza ku danîne  
ser xaniyê wî, hê ranekirine. Wî bêdeng erzuhalek  
ji karbidestan re nivîsand û tê de got, ji ber ku cezayê  
xwe yê zîndanê xelas kiriye, daxwaz dike ku  
hiciza li ser xaniyê wî bê rakirin, bi taybetî ku dixwaze  
bifroşe û ji vî bajarî bar bike û here bajarekî  
welat ê xwarê. Ji bilî vê, daxwaz ji karbidestan kir  
ku ew bi xwe li gor dilê xwe ciyekî jî jê re kifş bikin.  
Camêr bi xwe dizanî, helbijartina cîh heqê wî ye,  
lê xwest vî heqê xwe jî bixe destê wan. Piştî vê erzuhalê,  
wî bang kirin dayira asayîşê û sebebê vê biryara  
wî jê pirsîn. Wî jî got ku piştî mirina jin û  
zarokê wî û xerakirina xaniyê wî, qet peywendiyê  
wî ya bi wî awayî bi vî bajarî re nemaye. ciyekî  
din ê welat Jê re xweştir e. Bi ekis, li vir birînên  
î dike riya derew û  
Jigre û çawan van  
wî tên kolandin. Ji bilî vê hej  
fesadiyan ji nehezkerên xwe 1  
deh salên han ji vê navçê dûr ketiye, bi vî awayî jî  
bi kêfa dilê xwe jê dûr bixe, omrê xwe yê mayî ji  
sergêjî û qelebalixan dûr, bêdeng di bin siya qanûn  
û nîzamê de bibe serî!  
Van gotinan û raporên di derheqê aktîvîtên Camêr  
de hatibûn dan, karbidestan da bawerkirin ku Camêr,  
ne tenê kêrê wan, kêrê pêşmergekiyê jî tê de  
nema ye. Ji ber vê, alîkariya wî kirin ku bi zû karê

wî cîbicîh bikin. Lawe jî bikirekî peyda kir û ciyê  
wî bi bihayeke baş jê re firot.

Berî ew xaniyê xwe bifroşe, rojek li mala Lawe di  
oda wî de wan vedixwarin, wî berê xwe da Lawe û  
jê re got:

- Kekê Lawe, min bîryarek daye, hewce ye tu  
alîkariya min bikî ku em cîbicî bikin, çunkî ji bo  
hemû milan baş e!

174

Lawe, jê re got:

- Dê ka bêje, ez bizanim! Bêşik çi karê feydek te  
tê de hebe, ez amade me bi hemû îmkan û hêzên  
xwe ve alîkariya te bikim!

- Ez dixwazim ji sibê şûn de, ciyê xwe li vir biguherim.  
Ji xwe re ciyekî din bibînim. Êdî bes e ev  
tiralî û bêxêretî!

Lawe, piştî demekî serê xwe hejand û gotê:

- Carek berî hemû tiştî tu tiral û bêxêret nîn î. Ez  
ji dilek baş û xweş dibêjim, a herî baş ew e; tu  
cîguhertina xwe bihêlî piştî dest bi karkirinê,  
înşallah tu dê bi ser jî bikevî! Wî çaxî tu gilî û gazindek  
min ji cîguhertinê çênabe!

- Kekê min, ez yekî bi serê xwe me. Eger ji bo  
zarokan nebûya ez ji destpêkê ve nedihatim vir. Lê  
min got, hemû dinê dizane te zarokên min xwedî  
dikir, eger yekser ji zîndanê min berê xwe nedaya  
mala we, li gor min, dibû kerîtî û li ba xelkê jî  
bêwefatî bû!

- Ev gotin in. Ev çende tu hatî kesek ji hevalên te nepirsî ye, ez bawer nakim ji vir şûn de jî bipirsin. Ew ketine derdê xwe. Yên wekî min û te, meger tûşî reşgirêdanek bin ku ew jî ne gunehek tê de ye û ne jî kêra agirtefandinê tê!

- Li gor min wiha nîn e, ez û tu gelek ji hev cihê ne. Li ba dewletê ez mirovek im ku daxa zîndana sîyasî li ser eniya min e, lê tu yekî wekî hemû kurdekî adetî û sade yî. Piştî, gelo ne hewce ye ez ji wan çend rojên ku ez wenda bibûm, ders bishnim? Tu naçar bibûyî xwe veşêrî, mal, zarok û karê xwe di cî de bthêlî, ev tevên han ji rûyê min bûn! Vêca ez çima yekî wek te bêguneh tûşî vê bikim? Na na, bi tu awayî nabe di riya tiştêk bê tune de, ez carek din te û zarokên te têkim nav cenceseriyê û serê we biêşînim!

Ji ber ku, haya Lawe bi wê erzuhala Camêr tune bû ku ji bo bajêr dûrketinê dabû, difikirî û dida serî ku ji vir şûn de xwe hemû tiştêkî wî dûr bixe. Ew ji van gotinên wî ecêbmayî mabû. Ji ber vê gotê:

- Li gor min, ev gotinên te beredayî ne! Li gel vê jî

175

tu çawan baş dizanî, wisa bike!

- Ez gelek sipas dikim. Madem wiha ye, ez ê sibê ciyê xwe biguherim.

- Bila ser xêrê be. Baş e, tu dê bi ku de biçî?

- Ez hez nakim ji te re bêjim, çunkî, bi awakî şermokî, heta ez bangî we nekim, ez hez nakim

hûn bîn ba min. Her wiha, heta ez hinekî ciyê xwe  
rêk û pêk bikim ez ê bêm û bi xwe we bibim!

Lawe bi razîbûneke naçarî û bi ecêbmayinekê gotê:

- Baş e, giyana min bila ev jî bi dilê te be. Êdî  
tişteki te ma ye?

- Nexêr, gelek sipas.

Camêr hîs dikir ku Lawe wek zarokên nexweş pê  
re hereket dike, lê guhê xwe nedayê.

176

18

Nêzîkî mehek piştî wê şevê, Lawe êvarek ber bi  
mal ve diçû, du-sê roj bûn bi wext û bê wext Camêr  
dikete bîrê. Ji wê roja ku perê ciyê xaniyê  
xwe li dayira tapuyê ji bikirê wergirtbû şûn de, li  
tu ciyê nehatibû xuyakirin. Ji tu kesî jî seh nekiribû  
ku dikana kitêbfirotinê vekiriye! Eger Camêr  
baş nenasîya, ew dê jê biketa şikê û bigota: ketiye  
pê jinik, qumar û vexwarinê, ewqas bi ser de  
naçe, ew dê peran xelas bike û wek masiyê mirî  
bikeve ser avê. Lê wî dizanî ku Camêr ji van nîn e,  
lê ez nizanim zîndanê wî guhertibe! Ji bilî vê,  
rewşa wî ya meh û nîv berî niha jî wiha nîşan nedida.  
Çi bêje, ne dûr e ji ber feqîrî û belengaziyê  
xwe wiha dabe nîşan. Mirovên feqîr û belengaz,  
qumar û vexwarinê terk neke dê çi bike? Minet  
nebe, ew dê here herwîşk bixwe! Wek "M. M." yê  
hevalê min ê dibistanê, di îmtîhanan de digot:  
benîadem zalim e, di nav ava çeman de jî sêbahî

dike û di nav ya behran de Jî! Her neyse, ez gelek e ji vir şûn de rojên xwe bê Camêr bibim serî. Xwedê ji vir şûn de wî ji qeda û belayan biparêze, gelek derd û eziyet dîtih. Ew di van cûr fikran de bû, ji koşa kulanê derbaz bû, Aso Memend rast hatê, zerfek da destan û bi hêdîka gotê:

- Ev a Camêr e!

177

Êdî wek ku erd biqelişe ew têkevê, çawan ji nişka ve derket û bi wî awayî jî 1i ber çavan winda bû. Dema Lawe bi şaşmayî zerf kir cêba xwe, fikra wî 11 ser bêşermî û sarbûna Aso bû. ku li gor wî, ew berî ji Camêr zêdetir dostê wî bû. Lawe Tê nêrî du mirov di piştî de tên, yekî wî "T..." kurek ji taxa wan bû, xelkê şik jê dikir ku peywendiya wî bi dayîra asayîşê re heye. Ev yek bi hêztirîn pakî bû, ji bo sarbûniya Aso kir û gelek rehmet jî li gora babê wî anî ku evqas bi lez wezîfa xwe tamam kir û kesek jî pê neda hesandin.

Lawe, ji bo hal û xatir pirsîn hinek xwe li ber derî girt. Xwest li gel "T..." biaxive, lê wî firset nedayê û gotê:

- Tu çawayî kek Law? Ew çibû kurê Memend dema çavê wî bi te ket wek here nêçîrê wisa derket çû? Çi karê wî heye li taxa me? Xwedê xêr bike, va ye qasek e serê me sivik e!

- Bi rastî ew çibû. Ewqas bi lez ber bi min re derbaz bû, ez şaş mam, ka ew bû yan ew nebû?



- Ne ew bû, ez wî baş nas dikim, di ber min re derbaz bû. Bêşik bê silav. Çunkî em casus in û ew Jî welatparêz! Ew nizane ku eger ez casus bûma, min dê wî bida girtin. Qeyî nake herkes bi Xwedayê xwe.

- Herkes bi Xwedayê xwe. Tu bi ku ve diçî?

- Bi Xwedê niyeta min heye, ez bi Cemalê xalê xwe ve serek li xwîşka min bidin. Ew jî bi naçarî 11 wir dimîne. Kengê Xwedê dê avek bi vî agirî de bike û xelk ji xwe re Jê rizgar bibe. Em tev mirin. Bes e, bes e..! Xatirê te.

- Bi xêr ser çavan.

Wî li ber xwe ve got:

- Aferîn ji te û bi destleziya te re Aso can.

Lawe dema gihîşt milê din şîpana deriyê xaniyê xwe, zêrê ji cêba xwe derxist û vekir. Berî hemû tiştan, tomara deh dînanan jê ketin xwarê. Dema hejmart pêncî lib bûn. Vêca dest avêt xwendinê.

Camêr bi vî awayî nivîsandibû:

178

"Birayê giyan!

Li min bibore, berî hemû tiştêkî, careke din ez li hemberê wan hemû erk û eziyetên ku te di rûyê min, mal û zarokên min de kêşa, sipas dikim.

Bira! Ez Ji te venaşêrim, di muddetê sê-çar mehên dawî yên zîndanê de, hişê min li ser saha xebateke bêsinor a di riya destkevtî û xweşiya xwe û ya civakê de bû, ku min her wext ji xwe dipirsî: Gelo

dema ez rizgar bim, ez çî bikim? Mijûlî  
xwedîkirina Hêwa û Kalê bim an jiyana xwe ji bo  
Êêkanîn û cîbicîkirina hêvî û xweşiya gel amade  
ikim? Ez ji bo xwe bijîm an ji bo xelkê? Piştê vê  
xebata asê û tahl, 'ez', bi ser bahana ku bi jin û  
kurê xwe ve deh sal di riya xelkê de girtin û  
tûşbûna eziyet, derd û neheqiyên û li ser van tevan  
de, bi ser me de derîvenekirina yek ji wan kesan,  
serketim. Piştê ez difikirîm û min digot: Kes  
û kûsê gel pir e, lê Hêwa û Kalê bêkes in, ji bilî  
min hêviyeke wan tune. Ew eziyet û derdê min di  
riya gel de kêşa, êdî bes e. Ji vir û şûn de, ez ê  
mijûlî Kalê û Hêwa yê xwe bim, hemû jiyana xwe ji  
bo wan amade bikim. Belê, bi gotin netîca piranîya  
melhezên min wiha bû, lê rastiya vê serkevtinek  
vala û bêbingeh bû. Çunkî gelek caran dihate bi  
bîra min, gelo ez dikarim, bextiyarî û xweşiya xwe  
û ya Hêwa û Kalê, ji bextiyarî û xweşiya xelkê cihê  
bikim? Gelo ez dikarim, gulên hêviya xwe bînim  
ber berhem ku baxê hêviya gel hişk neke û nebe  
asteng li ber xelkê ku bigihîjin hêviyên xwe? Gelo  
dijmin riya vê dide û bawerî bi min a xwe ji xelkê  
dûrxistinê tîne? Gelo ji bo bawerî anîna dijmin, bi  
vî awayî ji nişka ve û bi yekcarî xwe ji xelkê qutkirin,  
nabe sebebê şermezarî û sernizmiya min, mal  
û zarokên min? Kes bawer bi wê dike ku devjêberdana  
vê rejîma han a genî û xwînmij Ji yekî  
wek min, bê tune bûye? Nexêr, ez bi xwe jî di wê

baweriyê de nîn im ku bê qîmetek bê tûne cîbicî  
be. Ev ên han tev, heta ez derketim, xalên melheze  
û lêkolînên min bûn. Dema ez rizgar bûm, ez  
hatim ser welatekî wêran, malên kavi, dostên  
179

girtî û kuştî, xizmên mal talankirî, xelkên bêguneh  
ên di bin daran de rizandî. Vê yekê, ji min re  
hê ji carê din zêdetir nizmî û nemerdiya destê  
xwe danîna ser kûmê xwe û xwe ji xeta sor  
dûrxistin, ronî kir û ez têgihandim ka ev çi ye. Ne  
dûr e mirov di demek nemerdî, tirsonekî û necamêriyê  
de bêje, 'tirs û selamet', ev jî dimîne  
wan gotinên Mame Reşeyê me ku digot: Tirs jî ku  
selametî destê te nexe, tu dê çi bikî? Di netîcê  
de, min biryar da ku tev van rastiyên han bixim  
ber çavên Kalê û dev Jê berdim û ew li gor dilê  
xwe bike û kîjan riyê Ji min re bibijêre wê riyê  
bigrim. Dûr nîn e, di vê biryara min de tirsonekî û  
xwe ji lêkolîn û netîca bûyeran veşartin hebe, lê ev  
tenê ji bo wê bû, ku di van deh salên han de ew  
derd û eziyetên min kiribûn gewriya Kalê, vî carî  
min wê xwedî heq zanî ku çarenivîsa me tevan  
bixim destê wê. Her çiqas carên berê Jî nayê wê  
manê, bi hemû awayî di destê min de bû, lê wekî  
te dît, hesaba min a li ser Kalê û Hêwa jî vala derketin,  
her wekî Xwedê hez kiribe, vê bahana min  
jî bibire!...

Vêca birayê min, piştî ew bûyerên bi ser min, mal

û zarokên min de hatin, piştî min li ber çavên xwe dît ku çi bi ser gel û welatê me de jî hatiye, ewqas hingî qasî serê derziyê mirovatî û camêrî di wê de dibînî ku yekî wek min bi serê xwe û bêkes û kûs, xwedî hîsa xwe lêpirsîn, fermana welat û neteweyî zanîn, serê xwe nizim bike û milê xwe bide ber nanpeyda kirinê. Nanê çi û ji bo kê? Kî heye ev nanê han bi wê bahayê bîne? Bila em nemerdî nekin ku xwîna van hemû xort, pîr, jin û mêran di valatîyê de biçe, nabe ku li ba tu kesê xwedî wijdan û şeref jî ev yeka han wiha be, lê girîna me tev ev e! Gelo wxîna zarokên min, tola Hêwayê giyan û şêrîna jiyana min dê wiha vala biçe? Eger lêborîn û çavlêgirtina destdaran tijî mirovatî be, lêborîn û desthelgirtina bêdestan tijî Ji ne mirovatî, sernizmî û giyana bendîtiyê ye! Vêca min melheze kir, hemû milên mesela xwe bi yek û du re mu-  
180

qayese kir, di rojê nîvroyê ya havîna gerim, di bin qirce qirça germek de, ji min re baş aşkera bû ku ciyê min çiya ye, ne bajar. Fermana min xebata çekdarî ya dijî dagîrker û zaliman e, ne dikandarî û ji xwe tirsîn e! Hêwayê min her tenê hêviya min bû, lê şoreş hêviya hemû gel e, hêviya bêhêviyan û hêvîdaran e. Ji ber vê, min biryar da ku ez biçim têkevim nav rezên xebatê. Ji bo barê xwe hinekî sivik bikim, min ciyê xaniyê xwe firot û vaye perê wî jî ez ji te re dişînim. Hinek Ji wî, yanî pêncî

dînarên wî, şûna ew perên te deyn dabû min e û  
yên din jî ji min re ji bo rojên tengiyê hilde! Nîvên  
din jî ez ê bidim serokatiya şoreşê. Ez hêvîdar im,  
ji ber wendabûna min tu tûşî tu nexweşiyê nebî.  
Her ji ber vê daxwazê jî bû, rhin ciyê xwe ji xaniyê  
te guhert û hinek ciyan min ji te re xeberan Jî gotin.  
Divê tu li min biborî. Êdî ez te dispêrim Xwedê.  
Cardin gelek sipas.

Not: Eger tu bixwazî name yan tiştek din Ji min re  
bişînî, tu dikarî di riya wî kesî ku vê nama han  
dide te, bişînî.

Birayê te: Camêr."

Herdu çavên Lawe tijî rûndik bûn. Tuka xwe di  
gewriya xwe de dabeland û ji ber xwe ve got:  
- Heqê wî bû, wî dê çi bikira? Çi kesekî din jî  
bûya dê wiha bikira. Bi rastî kurekî bedbext bû.  
Tiştek jê re li hev nehat. Xwedê bike di xebatê de  
wiha nebe, hegene serê wî dê 1ê tê de biçê. Xwedê  
lê megre, lê gelek qebebetê dayika min jî tê de  
hebû, eger Askolê dabûya wî, dê dîroka serê herdukan  
jî bi tevayî biguheriya. Hewce nake ku ez jî  
di bîrûbawerîya Camêr de bim ku digot, ev  
bûyerên han ên di serê wan de derbaz bûn, di  
çarenivîsa wan de hebû, dê bibûya û ku bû jî. Ez bi  
xwe tu manayek di vê de nabînim. Ew çîroka  
birîndarkirina xwe ya ji min re got, bû bingeş ji  
bo wan hemû derd û ezîyetên dawiyê. Bi gavekê, bi  
bawîşkekê, bi nefesekê û bi qasî muddetê girêdana

benê solekê, hemû diguhertin. Ez nabêjim ew

181

dê baştir an xerabtir bûya, lê tu carî ev nedibû ku bû. Mimkun e hinek kes bêjin, netîce her ev dibû ku bû. Lê ev gotina han rast nîn e. Ev tenê tesaûfê bû, tenê tesaûfê, bes.

Tiştê hat bi bîra wî û berken bû û got: ew jî bi ser çû, eger ew li bajêr bimaya mimkun bû piştî rojan birînên wî sar jî bûya û melheza maldanîn û nan jî bikira, lê niha? Hey ho! hey ho! Weyş Camêr giyan, bi rastî heqê te heye, bi çûna xwe evqas xwe bidî bîr kirin!

182

19

Dema taştîyek dereng bû, firoke di asîman de wek bazên biçin nêçîrê difiriyên. Reşayên bin wan dar, devî, gûnî û giran ên nedihatin xuyakirin, didan ber gulên şeştîr û bombeyan! Pêşmergên çekdar, lib û lib li biniya wan belav bibûn. Her yek ji wan, li ber kevîrê, di çalekê de, li ber dar û devîyekê xwe veşartibû. Camêr li ber kevîrê rûniştibû, çavên xwe kiribû asîmanan. Dema dengê firîna firokan dûr ket, destê xwe kir cêba xwe û nama Lawe ya jê re hatibû, dendst û cara sêyem xwend. " Camêr!...

Giyana min, ez daxwaza lêborînê ji te dikim. Çunkî min, ji bilî xerabiyê pê de tu qenciyek ji te re nekir. Ew roja tu hatî girtin, heta niha, ez derewan ji

te re dikim. Ev jî tev qebehetê derewa min a yekem  
bû. Ev derewa yekem, êdî wek marê Şêx  
Omer li bedena min aliya, min çend hewil da û  
têkoşîm, min nekarî ez xwe ji destan rizgar bikim,  
bi neçarî min derewên kêr dan berê ku bikarim  
bimeşînim, neherike. Bi vî awayî, navek re  
ez pê hesiyam ku çiyayekî ji derewan ketiye navbera  
me. Di seranserê vê sala han a dawiyê, min  
xwest bi çî awayî dibe bila bibe, ez çarek jê re  
bibînim û vê ji holê rakim, lê min çî kir û nekir.

183

min newêrî. Berî tu bê, ez gelek ditirsam, ez ditirsam,  
eger rastiyê bizane û rika wî ji min vebe û ew  
derewên han tev ji kîsên min biçê. Lê dema çavên  
min bi te ketin, ez têgihîştim, eger ez agahdariya  
xwe nebim û gelek hêdî û nerim vî çiyayî derew ji  
ber çavan hilnedim, mimkun e tiştên min kirî, tev  
ji kîsên min biçin û heta ez dîn jî bim. Ji ber vê,  
ez ketim ristina zêdetir derewan. Belê, vî carî ez  
naçar bûm, xelkê jî têkelê nav derewên xwe bikim!...  
Li gel vê jî, hingî diçû ez baştir bi wê digihîştim,  
ev kela derewan bi ser nakeve û wek çavgirtinek  
dê rastî derkeve û hemû eziyetên min 11 ber bayê  
bikevin û biçin...

Dema tu hatî girtin, kes nedizanî tu li ku yî û çî bi  
serê te de hat. Piştî şeş-heft meh xebat, hewildan  
û ricayê, me karî ciyê te û bendîxarta te bibînin,  
ew jî bi alîkariya xizmek dayîka Dara ku li wî bajarî

tu girtî, komîser bû. Ne ev tenê, me te jî pê da nasandin  
û amade bû ku bi çi awayî dibe bila bibe,  
namek me bigihîne te. Çunkî ewçax name şandin  
qedexe bû, musaeda kesek nedikirin peywendî bi  
glrtiyan re deynin, bi taybetî yekî wek te ku seroekî  
mezin ê 'Partiya...' dihesibandin. Dema ez hatim  
ser name nivîsandinê, ez mam ecêbmayî. ka  
gelo ez çi jê re binivîsim? Çi dilxweşiyek bidimê?  
Çi heye ez jê re bêjim, har û dîn nekim? Vêca ev  
rewayê heq e? Ez çi bikim? Ez dev jê berdim û  
qet nenivîsim, şerm e û dilê min jî nagre. Jê re  
name binivîsim û behsa jina wî tê ae nekim ku li  
ber janê di cî de hişt, ez şhadetiya nemiroviyê  
dixim ser xwe, çunkî wisa pê dide xuyakirin ku  
haya min ji wê nîn e. Hat bi bîra min, ez di wê  
şeva tarî ya jiyana te de, mumek vêxim, tîrêj bixe  
tarîtiya zîndana te, hêviyek bidim destê te ku tu di  
hemû salên zîndana xwe, xewa xwe pê bînî. Hêviyek  
ji te re hebe, tu xwe pê bigrî. Pişt re, min biryar  
da, ez binivîsim û min nivîsand, 'kurek Kalê  
yê xweşikê nazik bû û me navê wî danî Hêwa'. Ev  
destpêka derewa min an derewên min bû. Bawer  
184

bike, dema min nivîsand, min qet melheze nekir  
ku ev derewa han dê ev qas giran li ser min rûne,  
eger mimkun bû, bi vî awayî girê nedim. Piştî wê  
ku rewşa bendîxana te guherî û te dan bajarê 'N...',  
te ji me re name şand û daxwaza namên Kalê û



wêna Hêwa kir. Ez naçar mam, Askola xwîşka xwe jî bikişînim nav davikên derewên xwe, ku car û baran bi navê Kalê ji te re name binivîse. Ev yeka han bû, ku bû sebeb min ji te re zû bi zû wêne neşandin, lê te ewqas min şidand, ez naçar mam, min wênek kurê xwe Dara 1i te re şand.

Êdî bi vî awayî her derewekî min, ji bo berhevkirina palpiştan, birek derewên din ji xwe re dixwest. Hemû mexsed û merama min ew bû û bi daxwazeke paqij, min xwest, ez hêvî û ronahiyek bixim zîndana te ya tarî û ew xwîna demarên te biherikîne. Ji ber vê, heta nêzîkî berdana te, ez ji derewên xwe qet poşmam nebûm! Lê wexta ku poşmamiyê şaxên xwe li min werandin, bi taybetî piştî berdan û hatina te, hindik mabû ku ez dîn bibim. Min nedizanî ez çi bikim, ez çawan xwe rizgar bikim û çawan rastiyê ji te re bêjim. Ew roja min ji te re got, çûn mala xaltiya xwe, hema wî gavê tenê ew gotin hat ser devê min, min nezanî, Xwedê dê ku ji bo derewên min aşkera bin, wêran bike, qet nebe heta demekê. Lê çûna te nav 'L. A. N' , rê ji derewên min re nehîşt. Ez gihîştim netîceke wisa, min pêwîst zanî ku êdî tu rastiyê bizanî, bi taybetî piştî ku tu dizanî mirine, te şîn û girîna xwe jî kiriye, êdî ji ber çi tu nezanî çawan mirine.

Belê kekê Camêr! Kalê mir, lê ser hemla zarokan mir. Ew û kurê xwe eynî wê roja tu hatî birîndar

kirin, mirin. Bêguman gunehkarê mezin û sebebkarê mirina wan, ew dijminê zordar û xwînxwer e, ku te bi neheqî, bêgune birîndar û heps kir, wan di wî halî de hîşt, çûn û hatina bi ser wan de qedexe kir, qet nebe ji bo derxistina daxa dil, xelk û kesek din nekare doktorek jî bînin bi ser.

Ev bû çîroka derewên min, êdî ez nizanim, tu dê  
185

li min biborî yan na?

Birayê te: L..."

Camêr, ewqas giriya, hemû namê bi rûndikên xwe ter kir. Wekî ji xew hîşyar bibe, guhê wî li dengê hevalên wî bû, bi wî digeriyan û bang dikirin:

- Camêr!... Tu li ku yî, te xwe li ku veşartiye? Derkeve derve, em biçin, bombaran xelas bû.

Wî namê kir cêba li ser dilê xwe, çavên xwe paqij kir û bi bez xwe gîhand hevalên xwe.

186

#### ÇEND GOTÎN LI SER VÊ ROMANÊ

Di Nîsana sala 1956'an de, min dest bi nivîsandina vê romanê kir. Astenga nerî mezin a li ser riya min ew bû ku ka gelo ez çawan bikim vê ji destê sansora rejima nûker a kevneperest ê Nurî Seîd rizgar bikim û bigihînim destê xwendewarên kurd. Vê astengê min mecbur kir ku ez riya berê ya kevin, ya veşartina cî û wextê romanê û ronî nekirina nav û regeza qehremanê wê, bidim ber xwe. Lê ez heta hay lê bûm, wefata Şêx Mehmudê

mezin û di Teşrîna Yekem a sala 1956'an de êrîşa  
namerdane ya li ser Misrê qewimin. Hukumetê  
van bûyeran kir bahana kuştin û girtina xelkê Silêmaniyê  
û danîna hukmê orfî di seranserî Iraqê  
de ji bo girtin û îşkenca azadîxwaz û rewşenbîran.  
Ez jî ji çirîskên wê rizgar nebûm. Piştî girtina  
min, mala me ketibûn veşartina kel-pel, nivîs û  
kitêbên min, heryek ji wan li ciyek veşartibûn û  
her bawulê ber bi milek de rê kiribûn. Dema ku  
zulum û zorî hinek sist bû, ez hêdî hêdî ketim pê  
tiştên xwe û lê min hinek kitêb û nivîsên xwe  
peyda nekirin. Ez gihîştim wê baweriyê ku ew kesên  
ev tişt li ba wan hatine danîn, wan ji tirs  
zulum û zordariyê şewitandine. Min dît ev romana  
han jî yek ji wan e. Min gelek hewil da ku carek  
din ji nû de binivîsim, lê min nekarî. Bi vî awayî  
187

heta pêrar, ji nişka ve havrêyek min ji min re  
bawulek kitêb anîn, min dît ku ev romana han jî tê  
de ye.

Berî wê ku kovara Rizgarî daxwaza romanek ji min  
dikir, min qebul kir ku ev wek salên hatî  
nivîsandin bê weşandin. Ji bilî wê romana di sala  
1934'an de min nivîsandibû û li gor baweriyê min  
hîn dema weşandina wê nehatiye. Ne tenê ev, min  
wê yekê jî da xuyakirin ku qet destlêdanek bi wî  
awayî lê nekim ku awa, tam û bîhna dema  
nivîsandina wê ji ser rakim. Belê, ji ber vê va wekî

min çawan di sala 1956'an de nivîsandiye, ez romana Hêwa yan jî bi navek din Jana Gel, pêşkêşî xwendewarên Rizgarî dikim. Hêviya min ew e bi dilê wan be.

20/06/

1969

H. L. B

Di hejmara 7'ê eynî kovarê de (21/09/1969) mamoste Birahîm vê yekê jî nivîsandiye:

"Li ser daxwaziya bicî ya hinek xwendewarên hêja, min biryar da ku navê qehremanên romanê ya aşkera binivîsim."

Ez jî hêvîdar im ku mamoste Birahîm me ji van cure berhemên hêja yê edebî bêpar neke...

Kemal Fuat

27/06/ 1973-Silêmanî

188

Pirtûkên Çapxane û Weşanxana APEC yê ku hatine çapkirin:

- 1- Ken û Girîn -1989 Bertievkar: A. TîgrisûR. Motkî (pêkenîn)
- 2- Iqdê Durfam -1989 Şêx Eskerî (fabil)
- 3- Oal (hebest) - 1 989 Şêrko Bêkes (destan)
- 4- Navên Kurdî - 1990 A. Tîgrîs (navên Keç û lawan)
- 5- O Bir Dag Çiçegiydi - 1990 Xorto (ani)
- 6-SrverekteBirGeceVakti-1990 Xorto (ani)
- 7- Herdûbat - 1990 MeleZahîoe Dîywbekiri (Mewlûda kurdi)
- 8- Çend Rûpel Ji Dîroka Gelê Kurd - 1990 Dr. K. Mez/»r (gotar-meqale)

9- KQrdislan'daKapftafizmin Gelişme Özellikleri 1990 -S.

AydoQmuş -A.Nas (araştırma)

10- Mehmed Arifê Cizîrî Kewê Ribad e - Segvan Abdulhekim

(Jînegîgarî û huner )

11- Gulbijarek Ji Hebestên Şêrko Bêkes (Helbest bi pîtên latînî û bi dîyalekta sornî ne)

12- Nîşan û Dawet 1991 - Amed Tigrîs (Xwazgînî, keçrevandin, şîranî, cihêz, qelend,

dawet, şabaş, pêşbirik, şanogerî, mehrbirîn, bûkguhastin, sêroj û zeyîtiyên Kurdan)

Pirtûkêndersê

1- Oîroka Kurd û Kurdistanê (ji bo sinifên 5- 9 ) 1990 , Bi kurmancî -Amed TigrîsûAso Germiyani

2- Kurterastî ( ji bo sinrfên 5-7) 1991 , Bi kurmancî - Amed Tigrîs û B. Welatevin

3. Dîroka Kurd û Kurdistanê ( ji bo sinifên 5 - 9) 1 992, Bi sorani - Amed Tigrîs û Aso Germiyanî

Pirtûkên me yên ku derkevin

1- Roj bi roj Şerê Avtengê û Kurd - Amed Tigrîs, C. Loran û Xorto

2. Cografya kurdistan

3. Kurterasti ji bo cografya - Werger: Nasir Rezazi - Bi sorani

4- Dîroka musik û heyama huner li Europa- Omed Muhedin Mohammed

Navnîşanaxwestinê:

Box3318,163 03Spanga-Sweden Tel: 08-761 81 18 Talefax: 08-761 24 90 \* P.G. 4686512-7

\*\*

KEÇA KAPÎTAN

A. A. PUŞKIN

ALEKSANDR SERGEYEVÎÇ

PÛŞKÎN

KEÇA KAPITAN

ROMAN

JVerger: Hesene Mete

weşan£nwelat

Stockholm 1988

Weşan: 1

KEÇAKAPÎTAN

Çapa Yekem

Ev pirtûka li ber wergera swedî,

ji ya tirkî hatiye wergerîn.

Pergala berg û rûpelan: N. Kirîv.

PÛŞKÎN

(1799 - 1837)

Aleksandr Sergejevîç Pûşkîn di 27'e gulana 1799'an de li Moskvaye ji diya xwe bûye. Lawe malbatek dewlemend û revvşenbîr e. Wek hemû zaroken malmezin û dewlemenden we roje, Pûşkîn jî di piçûktiya xwe de bi hîmgîriya klasîken fransî mezin dibe û pirtirîn li ser lîteratûra yevnanî û fransî disekine. Hîna di heştaliya xwe de, Pûşkîn zimane fransî wek zimane xwe î zikmakî dizane û ji hela din ve, Pûşkîn dadeyek heye ku gundîyek ûris e. Herweha tev zimane ûrisî meteloken ûrisan jî ji ve dadeya xwe hîn dibe.

Di duwanzdesaliya xwe de, Pûşkîn di dibistana bi nave

Tsarkoye Selo(\*) ye de dixwîne. Ev dibîstan bi deste devvlete

hatiye avakirin û bi mamosten herî zane û xwende ye. Ew pejnen

ku li male li Pûşkîn ranabin, li vir le dicivin. Ji ber pewendiyen xwe yen germ, di nav hevalen xwe de te hezkirin. Ji van hevalen wî, gelean ev hevaltîya xwe ya jidil, heta mirina wî jî domandine.

(\*) Tsarkoye Selo: Ev dibîstan nuha bi nave Dibistana Pûşkîn te binavkirin.

Di dema xwe ya xwendekarîye de wek gelek hevalen xwe, Pûşkîn jî dest bi nivisîne kiriye. Helbesten wî xweştir û hejagir. in, ji ber ku hevalen wî, tene bextreşî û tengasiya jîyana xwe ya buhurî dinivisin. Le Pûşkîn xweşî, şadî û heviya rojane di helbesten xwe de tîne zimen. Henveha di navbera salen 1813 û 1815'an de bi nivisîna van helbesten xwe yen xweş deng dide.

Piştî ku di sala 1817'an de dibistana xwe tewaw dike, li Petersbûrge di arşîva wezaretê derveyî de wek karmendekî dest bi kar dike. Ev kar heta dereke je re dibe alîkar ku ji bo nivisandine ji xwe re mijaran berhev bike. Le ev kara ne karekî ber dile wî ye. Raman û armanca wî her nivisîn û edebiyat e.

Berhema wî ya peşîn Rûslan û Lûdmîla di sala 1820'an de diweşe. Dema ev berhema wî belav dibe, mamoste û helbestvan î bi nav û deng Zûkovskî ji Pûşkîn re portrekî xwe dişîne û bi nivisa li paş portra xwe, pesne vî helbestvane ciwan dide.

Di ve navbere de Pûşkîn dest bi nivisîna helbesten polîtîk dike. Giraniya naveroken wan li ser nakokiya xulam û dewleinendan e. Ev mijaren ku ew bi lev dike, ne tene di nav radîkalan de, le li derûdora dewlemendan jî belav dibe.

Malmezin û devvlemenden we roje, ji van helbesten wî yen polîtîk gelek nerihet dibin. Di vî warî de Çar bi xwe weha dibeje:

«Nivîsaren Pûşkîn, li seransere Ûristane dibe sedema tevlihevî û aloziye.»

Henveha xebata efseren radikal, r&ristina Dekabrîstan(\*) jî derdikeve hole. Li ser ve yeke hemû malmezin û devvlemend peyva xwe yek dikin ku ji bo çareserîya ve yeke herîşeke bibin ser radîkalan.

Ji van radîkalan gelek rewşenbîr û zana tene kuştin û pîrî wan bi ber tawana dûrandine dikevin û heta Sibîryaye ten (\*) Dekabrîst: Dekabr bi rûsîname meha zivistana peşîn e. Radîkalin we roje, ji ber ku di ve mehe de serhildanek li darxistine, loma ev nava li wan bûye.

şandin. Pûşkîn bi xwe jî di nav wan de ye. Le ji bo xatîre ciwanîyawî û ew bandora ku ziman û şarîzatiya klasîken fransî li wî kiriye, ew te bexîşandin û ji dela Sibîryaye ve wî dişînin başûre Ûristane, cem generalekî kevn î bi nava însor ku çavderîya wî bike.

Ev dûndstina ji Petersborge, ji bo Pûşkîn dibe rûkeniyek jîyane. Lewra H vir pir dixwîne, rastî gelek kesan te, xuşîna pelen Behra Reş û bilindiya zinaren Kirime bi çave xwe dibîne. Rewşa xelken van deverna li ber çaven wî wek peşmalek pînekirî rengoreng dixuye. Ev hemû jî ji Pûşkîn re dibin mijar û sedem ku ew binivîse.

Di sala 1824'an de wî dûrdixin navçe Pskov, li wir di wargeha diya xwe de, li Mîkaylovskoye dimîne. Heta sala 1826'an li vir dijî û xwe bi tevayî dide nivisîna Yevgenî Onegîn û beşe mezin î ve berhema xwe U vir tewaw dike. Di tenetiya van sa-



len wî de mijara berhema wî ya Borîs Godunov jî xwe dide ber.

Bi nivisîna van berhemen xwe, Pûşkîn digehije bandevva babete ve nivîse. Pûşkîn, Byron û şopen wek wî xwend, xwe gihande wan û ji wan derbastir jî bû. Le ew her birciye zanebûn û nûyine bû. Ji ber ve yeke derbasî babete nivîsaren dîrokî dibe, pirî caran kat dike û dixwaze gelek kes bidin ser sopa wî.

Dema Nîkolaûs I. ji bo vvergirtina taca sere xwe te Moskvaye, ew Pûşkîn banî dadpirsiye dike. Li wir Pûşkîn bi awakî vekirî pe dide zanîn, ku di serhildana Dekabrîstan de ew U Petesbûrge buya, be şik wî e di nav wan de cî bigirta. Li gel ve gotina xwe dive Pûşkîn pûçîya ve tevgere jî je re bi lev kiri be. Lewra Nîkolaûs piştî peyivîna xwe dibeje: «Ez bi baqiltirîn meriv î Êristane re peyivîme.» Ji bo ku Nîkolaûs wî bide hela xwe, soz û bext dide Pûşkîn ku ji vir û weha ew e bi xwe li nivîsaren wî binere. Le dûre Nîkolaûs ve berpirsiyariya sansore dide şefe polîsen polîtîk. Henveha ev azadiya Pûşkîn jî dibe wek azadiya çûçikek şaper.

Ji vir û şûnde sîyek bewext û tarî dikeve ser jiyana Pûşkîn. Edî ew pejnen wî yen nivisîne, wek hertim ranabin. Kem çaşandin. caran,

ew jî li demsalen payize kela dile wî radibe. Payiza sala 1830'ê je re dibe demsala herî berhembarr. Ê dest dave nivîsîna çarçova berhemen xwe yen dramatik; Sivvare Deqdor (1829), Mevane Kevirîn (1830), Mozart û Salîerî (1830). Ê dûre jîÇîroken Bîyelkîn (1930).

Le Pûşkîn ji dileriya xwe nakeve û ji dîtinen xwe naye

xware. Helbasten wî yen bere jî, yen li ser kûştin û dûndstina hevalen wî jî dide xuyakirin ku dilsoze doza xwe ye. Wexta Çar bi peşniyara ku wî bike helbestvane qesre, te ba Pûşkîn, bi rûreşiyek mezin ji ba wî diçe. Ji ber ve yeke, dijîtiya di navbera Pûşkîn û desthilatan de diwartir û hişktir dibe. Levvra edî pirsgirek ji ser dîtinên polîtîk xericîye û bûye dozek şerefe.

Di sala 1831'ê de Pûşkîn bi evîndara ber dile xwe, Nataliya Gonçarovnaye re dizevuce. Ji ber xweşikî û sersivikiya xwe, ev jinika ciwan bi derûdora qesre re tavile dikeve nava pewendiyên fahşekî. Dema Nataliya dibîne ku Çar bi xwe jî bi we re U ba dikeve, ev bextiyariya we li sere we dixwe û xwe wenda dike. Pûşkîn bi her awayî dixwaze ku we ji qesre vekeşîne. Le NataUya guh nade wî û her bi ya xwe dike. Ê heta ku rojêke Baron Heckerend Aýýtes ji jina wî re nameyek xirab dişîne.

Henveha kul li ser kule di dile Pûşkîn de vedibe û jîyan le diherime. Hevale wî yen ku hatin kuştin, yen ku ketin bendîxanan, yen ku ji waren xwe hatin dûndstin û bi kare zore hatin arihandin; ev hemû li ber jiyana Pûşkîn dibin astengen reş û tarî. Di vî salî xwe î civvan de xwezila xwe bi mirine tîne. Piştî navnotiya jina xwe jî, edî nikare li ber xwe bide û Baron banî duelloye dike. Di roja 17 çele zivistana sala 1837'an de, di duelloye de ji zike xwe birîndar dibe. Ê bi du rojan piştî ve birîna xwe ya giran, di ciwaniya sî û heştah'ya xwe de dimire. Beriya hertiştî Pûşkîn di dema xwe de di edebiyata ûris de helbestvanekî mezin e. Heta dem xwe digehîne Pûşkîn jî,

edebiyata ûris li ser riya klasîzm û romantizme ye. Ev jî pirtirîn ji bandora niviskaren roavayî dihat.

Pûşkîn bi xwe jî gelekî van klasîkan dixwîne û heta demeke jî li ser riya Byron, Shakespeare û Walter Scott dimeşe.

Le ew ve riya wan, ji bo xwe wek ronahiyeye bi kar tîne û di dawiya dawîn de ji xwe re babete hunerek taybetî peyda dike.

Û ev babete hunera ku te gotin, riyek realîst e. Ji xwe berhe- ma Keça Kapîtan jî xweş dide xuyakirin ku PûşkînU ser riyek realîst bûyere dîrokî bi pejnên evînek piçûk dide. Ev babete nivîse jî ne tene ji bo wî, henveha ji bo hemî niviskaren we roje jî dibe şopek nû. Hej di pey wî re jî U Ûristane niviskaren mezin wek Tolstoy û Dostoyevskî, car bi car vegeyane ser berhemên wî û xwendine ku bizani bin ka çarçova çîroken weha çawa ne û bi çi awayî tene hûnandin.

Li Ûristana we roje gelek niviskar li ser sopa wî, xwe digehînin daraxa berhemên baştir. Rexnegîr î mezin Bîelînskî berhema Pûşkîn ya bi nave Yevgenî Onegîn wek ansîklopediya jiyana ûris bi nav dike.

Pûşkîn, Keça Kapîtan salekî beriya mirina xwe dinivise (1836). Piştî ku ew werdigere gelek zimanan, bandorek mezin li edebiyata dine dike. Û dibejin ku Tolstoy ji ber ve bandore, berhema xwe ya bi nave Şer û Aştî nivîsiye. Le Dostoyevskî di nameyek -ji biraye xwe re dişîne- xwe de li ser Pûşkîn weha dibêje: "Ew helbestên narîn û herikbar yê Pûşkîn ji çend rezikan ne zedetir in. Ev narîn û herikbariya wan jî ji tiştê te ku, niviskar her U ser hûr bûye û guherîn le çekiriye."

Ji bo Keça Kapîtan Gogol dîtinen xwe weha vedike: "Roman û çîroken me yê direj li ber Keça Kapîtan xav dimînin,

ku em wan bidin ber hev. Saxikî û nermokî digehije daraxek wusa bilind ku rastî jî wek tiştêkî lihevhanî û karîkatorîzeyî dbcuye. Cara yekem e ku bi rastî jî karakteren ûris derdikevin hole."

Reng e, ew dema ku Pûşkîn te de dijî, di bin çavsoriya Çar û dewlemendan de ye. Rewşa gundî û xulamen we roje bala radîkalan û rewşenbîran dikeşîne. Bi peşengiya Dekabrîstan rexistinek dîzî te damezrandin. Li hemberî dewlemendan, Dekabrîst di sala 1925'an dikevin amadeyiya serhildaneke. Pûşkîn bi xwe ne di nav wan de ye, le ji nezîk ve geleen wan dinase û bi hunera penûsa xwe ve nakokiya desthilat û xulaman H ber çavan radixe. Le Pûşkîn ne niviskarekî gundî ye.

Ew niviskarekî peşverû û netewî ye. Gelek Dekabrîsten we roje, di dadgehan de U xwe mikûr ten û dibejin; me dîtinen xwe yen şorşgerî cara peşîn ji Pûşkîn û berhemen wî girtine. Ev jî dide xuyakirin ku di ware dîtinen polîtîk de, çarçova bandora berhemen Pûşkîn di dema xwe de gelek fere û rolekî mezin lîstine.

Hesene Mete

10

-IGRÛHBANEKÎ

HEZA PAREZGER

Ew e sibe bibe kapîtanekî hezaparezger

Ji te re çî?Devje berde bila bibe leşger

Rast e! Bila poze wî bişewute

Baş e, bave m kîye?

«Knyajnîn»

Bave min Andrey Petroviç Grînyov, di xortaniya xwe de U

ber deste Kont Munch kar kiriye. Di sala 17\*\* de bi pirpirken serhengî, emekdar bûye. Ji we roje û vir de li günde xwe î Simbîrske dijiya. Diya min Avdotya Vasüyevna Y. jî ji wir, keça malmezinek xizan bû. Li Simbîrske ew û bave min zewucîne. Em neh xweng û bira bûne. Hemû xweng û birayen min di peçektîya xwe de mirine.

Dema ku ez hîna di zike diya xwe de bûme, bi alîkariya B. î serhenge heza parezger, ez û alayiya Semyonoske wek grûhban hatime nivisîn. Ku hemû heviya wan U avare çûba û diya min keçek hani buya dine, we çaxe bave min e mirina vî grûhbane ku hej ne hati bû dine, ji tiye ciyen re bigota û herweha ev tişt e ji dine hilata.

Heta ku min hîmgirtina xwe biqedanda, ez e henvekî îcazegirekî bihatama xuyakirin. Awaye hîmdayina we deme ne wek ya aniha bû. Piştî ku ez ketim jiya xwe ya sala penca, bave min ez dam ber deste Savelyîç î seyîs. Ji ber tevgeren xwe yen çavekirî ew jî bû bû lalaye min. Piştî ku di bin çavderiya wî de ez bûm duwanzdehsalî, edî ez wusa baş hînî xwen-  
11

din e nivisndine bû bûm ku, be awiqîn min dikari bû li ser jîr û j ariya cewrek tajiye peyv bikira. Di ve navbere de bave min ji bo min fransiyekî bi nave Monsieur Beaupre da hanîn. Ji Moskvaye bi şerab û pevvîstiya sale re ew jî hati bû siparişkirin. Hatina fransî dile Savelyîç gelekî teng kir. Her xwe bi xwe dikire pilepil û digot: Ma çi kemasiya zarok heye? Ji xera Xwede re şûştina wî, xwarina wî li cî ye. De qeye tu merive te li vir ne man, veca tu biçî mîsyoye xelke bîne û li avare pera bireşîne!

Beaupre li welate xwe berber bûye. Dûre di wexteke de H Prûsyaye leşgerî kiriye. Paşînge jî pour etre outchel(\*) beyî ku baş bizani be ka bejeya dawîn çî ye, rabûye hatiye Ûristane. Xortekî baş bû. Le gelek tolaz û derbeder bû. Kemasiya wi ya herî mezin jî, doxînsistiya wî ya li hemberî jinan bû. Ji ber ve yeke jî pirî caran sîle li bine guhen wî diketin û edî bi rojan gilî û gazin dikir û dibû ufeufa wî. Ji derveyî viya, ü gor gotina wî ew ne neyare şûşe bû. Ango em bi ûrise bibejin: Miriye vexwarina meye bû. Le U mala me şerab bes piştî nanxwarine û ew jî piyalek piçûk tene dihate vexwarin û her çare jî mamoste reben dihate jibîrkirin. Ji ber ve yeke Beau-pre xwe zû hînî nastoyka(\*\*) ûrisî kir. Dûre ji bo zikeşe gelek pesne we da û ew ji şeraben welate xwe çetirand.

Ez û mamoste fransî tavile bûn dosten hev. Li gor peymaname, diviya bû wî fransî, almanî û hemî zanist hînî min bikirra. Le ji dela viya ve, wî dikir ku U ser linga ew bikari be hinek ûrisî ji min hîn bibe. Dûre jî edî em herkes bi kare xwe daketin. Navîna me gelek baş bû. Ji bo min, mamostekî ji wî baştir peyda ne dibû. Le çerxa feleke em zû ji hev qetandin. Binerin be ev çawa bû.

Herdu keçik, Palaska cilşoya goştî û rûxurî, û Akûlka yekçava gavan rojeke peyva xwe yek kirine, di dest de çûne xwe havetine lingen diya min û gunehkariya xwe ya mezin li xwe danîne.

(\*) Pour etre outchel: Ji bo ku bibe mamoste.

(\*\*) Nastoyka: Meyek ku ûris li male çedikin.

12

Bi hesren çaven xwe, gilî û gazinen mîsyo kirine ku wî ew

xapandine û ji re denristine. Ê diya min ya ku di van tiştan de behenek e, rabûye tavile ev bûyera gihandiye bave min. Bave min jî ne ji wan kesan bû ku beriya arihandine dût û direj bifikiriya. Tavild fransiye deqdor daye bankirin. Le pe dane zanîn ku mîsyo xerîkî hîmdayîna min e. Bave min jî rabûye hatiye oda min.

We çaxe Beaupre xwe li ser lihefan direj kiri bû û pixîna wî bû keti bû xew. Xwm di rehen min de cemidî. Li vir dive ez bi we bidim zanîn ku ji bo min nexşeyek geografiye ji Moskvaye hati bû xwestin. Ev nexşeya, beyî ku qet bi kar hati be, ji kengî ve bû ku bi dîwer ve daliqandî bû. Xweşikî bû û mezinbûna kaxiza we, pirî caran bala min kişandi bû. Di davviya dawîn de min biryara xwe da ku ez ji we firokeke çebikim. Xewveçûna Beaupre jî ji min re le hati bû û min dest bi kare xwe kiri bû.

Min edî fikir ku ez ji qaşiken daran boçeke bi Mîs Dobrey Nadejdîye(\*) ve bikim, bave min kete hundur. Çer ku bave min çav li desthînen min yen geografiye xist, guhe min kişand, dûre ber bi Beaupre lezand, bi niquncandin merike reben ji xew rakir û dest pe kir, çi hate ber deve wî je re got. Beaupre bi xwe nizani bû ku çi bi sere wî de hat. Dikir ku rabe ser xwe le bi ser ne diket. Ji ber ku heta qirike serxweş bû. Beyî ku hej hay ji xwe hebe, bave min bi hustukura wî girt, ji ser lihefan rakir û di derî re havete derve. Ê we roje jî tavile ew ji vvargehe qewutand. Kefa Savelyîç bû bû kefa gur. Ê henveha hîmgiriya min jî qediya.

Je û pe ve, li gund ez li pey kevokan beziyam, bi zaroken xulaman re kerkerane lîstim û min çend salen xwe yen din jî

buhurand. Le sala ku min edî şanzdehe xwe tije kir, di jiyana min de guherînek bingehê çebû.

Rojeke payize, diya min li eywane qax dikeland. Ez jî li wir rawestî bûm, min li bilqîna bilçikan dinerî û min ziman H (\*) Mîs Dobrey Nadejdî: Bi ûrisîye. Pozekî di binê v/elate Afrika Başûr deye. Bi tirkîjâ re dibejin: Ümit Burnu.

13

dora deve xwe dixist. Bave min li ber pencere rûniştî bû û ew saldeftera qesre ya ku hersal digirt, dixwend. Ev pirtûkek wusa bû ku qet je ter ne dibû. Di her xwendina we de dilhejiye pe digirt û mest dibû. Diya min ya ku edî hemû xwî û tevgeren wî ji ber kiri bû, heta ku ji dest dihat, we hertim ew ji ber bave min vedişart. Ê henveha pirî caran bi mehan çave bave min le ne diket. Le ku careke jî le rast bihata, bi saetan edî ewji dest xwe danedihanî.

Aniha bave min rûniştî bû û saldeftera qesre dixwend. Carina wek ku guhe xwe nediye, xwe bi xwe dikir pilepil û: «General!... xwe gihand liqe min!... Xwediye du pirpirkan!... Aya bi wî re, ji zû ve...» digot. Dûre bave min ew havete ser dîwançe û kete fikreke kwîr. Demen ku bave min weha noqî ramanan dibû, nerihetiyeke bi min digirt.

Paşînge ji nişka ve zivirî ser diya min û got:

- Avdotya Vasîlyevna, Petrûşa çend salîye?

Diya min bersivand û got:

- Ling havetiye huvdesaliya xwe. We sala ku meta Nastasya Garasîmovna ji çavekîxwe bû, û... dûre...

Bave min:

- Baş e, got û peyva we birî. Wexta wî û vatiniye hatiye.



Dive edî li pey keçikan negere û bi helînen kevokan ve hilneperike. Fikra diya min ya ku ew e ji begavî ji min biqetiya, dile we ewqas teng kiri bû ku, kevçiyê di dest de rep û kete beroşe, û hesir di ser gupen we de rijyan.

Û katkirina we dilhejiya ku min di dile xwe de hîs kir, diwartir e. Ramanen leşgerbûyine, di sere min de tevlihevî xeyalen azadî û bextiyariya jiyana Petersbûrge dibû. Min xwe di heza parezger de wek efserekî dihanî ber çave xwe. Li gor min, ji bo merivekî bextiyariya herî mezin, ev bû.

Bave min ne ji guhertina biryara xwe û ne jî ji direjkirina wexte kefxweş bû. Biryara we roja ku ez e teketama re, hat girtin. Roja beriya ku ez e tekevim re, kaxiz û penûs ji min xwest ku wî e nameyek binivisiya û min e bi xwe re bibira û bida femandare xwe.

14

Diya min got:

- Ji bîr neke Andrey Petrovîç, silave min ji prens B. re leke û je re bibê; ez hevîdar im ku ew e wek bere, naha jî ser û siya wî li ser Petrûşa hebe.

Bave min mirûze xwe tirşand û got:

- Ev çî peyv in! Keji prens B. re name nivisiye?
- Ma bi gavekî berî nuha te ne got ku ez e nameyekê ji femandare Petrûşa re binivîsim?
- E, çî bûye?
- Ma femandare Petrûşa jî ne prens B. bû? Û ne me Petrûşa li alayiya Semyonovske nivisi bû?
- Nivisi bû! Çî ji me re ku li kudere hatiye nivisîn? Petrûşa naçe Petersbûrge. Ma eweli wir bi kerî çî were? Qet, ew e li

wir hînî tolazî û beradayiye bibe. Na, baştir e ku biçê leşgeriye,  
bila hustuye wî biçike, behna barûte biçê poze wî ku  
bibe leşger, ne nereker! Me ew li heza perezger nivisiye, tew!

Ka şinasname wî U kudere ye? Ca bîne vir!

Diya min çû, şinasname û işliðe min î vaftîziye ku di qutiya  
xwe de veşarti bû, dendst û hanî, bi destlerizîn da bave min.

Bave min dûr û direj xwend û dûre li peş xwe ew danî ser  
mase û dest bi nama xwe kir.

Ji mereqan tewatî ne diket min. Wan ez bi kudere de dişandim  
ku ne Petersbûrg buya? Min nikari bû çavân xwe ji ser  
penûsa bave xwe biçerixanda -penûsa ku hedî hedî diçû û dihat.  
Dûre name qedand, tev şinasname min ew kir hundure  
kîsekî kaxizîn, şeşiland û dûre banî min kir:

- A, ji te re ve name. Min ji heval û doste xwe î kevn Andrey  
Karloviç R. re nivisiye. Tu e biçî Orenbûrge, di bin femandariya  
wî de leşgeriye bikî.

Dest û pî li min sar bûn, hemû hevîyen min li ber bayî çû  
bûn. Ji dela ve xweşxeyalen jiyana Petersbûrge, xemgîniya  
ciyekî melûl li peşiya min bû. Bi qasî deqeyekî bere, ew fikra  
leşgeriya ku min e ji dilûcan bikira, aniha li ser piye min bû  
bû wek barekî giran. Le tiştêkî ku bihata kirin jî tunebû. Sibetira  
roje taxûk li peş pelikan sekinî. Valize min, qutiya ku taxime  
min î çaye te de, kulor û kulîncen ku di male de diyariya

15

şûmiya min ya dawîn bû, di taxûke de hat cîkirin. De û bave  
min derketin ku min bi re kin.

Bave min:

. - Riya te vekirî be, Pyotr, got. Li ser sonda xwe be û rastiye

bike kare xwe. Guhdariya femandare xwe bike. Ji bo aferîngotina wan, zede xwe neheşîne, le ji kar jî nereve. Û ve gotina mezinan jî tu carî ji sere xwe dernexîne: Kince xwe di nûtiye de û şerefa xwe di xortiyê de bipareze.

Diya min bi girî û hesir şîretina H min kir ku ez xwe hemet bikini. Li Savelyîç jî temî kir ku ser û siya wî li ser lawe we hebe. Kurkekî ji poste kergû U min kirin û saqoyekî ji poste rovî jî di ser wî de li min peçandin. Piştî ku ez jîbi Savelyîç re di duruşke de rûniştim û em bi re ketin, hesren çavan hatin xware.

We şeve me xwe gihand Simbîrske. Li vir ji bo kirîna hinek tiştên pewîst, diviya bû em rojê dawestiyana. Berpirsiyariya vî kare kirine dabûn Savelyîç. Em daketin xaneke, ez li wir mam, heta evare Savelyîç li ser firoşgehan geriya. Ji rûniştin û meyizîna kuçekê teng û gemar, ez westiyam û min xwest ez di hundure xane de bigerim. Dema ez ketim hundure salona büardoye, min mîrzayekî U dor sî û penc salî, bejndirej, bi simbelek reş û zirav li wir dît. Kirasekî şeve û navpiyê wî, şiva büardoye di dest de û qelûnek jî dabû nava diranan xwe. Hevale wî î lîstikê marqêçiyê salone bû, ku bi ser keta, wî e pîyalek votka vexwara; ku bi ser neketa jî, ew e teketa bine masa büardoye û bi çarpekî xwe bikeşkeşiya. Ez rûniştim û min li wan temaşe kir. Her ku lîstikê direj bû, marqêçî serî çare diket bine mase. Ede wusa bû ku marqêçî ji bine mase derneket. Mîrzayê simbelreş mîna ku li ser miriyekî bixwîne, çend peyven giran ji wî re got. Dûre zivirî ser min, peşniyar kir ku ez jî partiyeke bilîzim. Min peşniyar le vegerand û min got ez büardoye nizanim. Xweş diyar bû ku ev bi wî seyr hat. Nola ku

dile xwe bi min dişewutand. Le dîsa jî me şorgermî kir. Ez tegelîştîm ku nave wî îvan Ivanovîç Zûrîn e, û li alayiya parezgeriya \*\*\* fermanar e. Hatina wî ya Simbîrske, ji bo karûbaren leşgeren nûhatî ye û loma jî aniha li ve xane ye.

16

Piştî Zûrîn tegehîşt ku em e bibin karhevalen hev, bi dilsoziyek leşgerane ez vexundim navroje. Min bi kefxweşî ev pejirand. Em li keleka maseyeke rûniştin. Zûrîn gelek vedixwar. Edî dive tu xwe hînî jîyana leşgeriye bikî, digot û pîyala min her dadigirt. Hinek pekenînen leşgerî kat dikirin ku ez pe ji ken dimirim. Dema em ji ser mase rabûn, edî em bû bûn destbirake hev. Naha jî dixwest ku min hînî lîstika bîlardoye bike û digot:

- Ji bo me efseran, gelek pewîst e ku ve lîstike bizani bin. Em bibejin ku di cewlekî de riya we bi bajerekî piçûk ket, hûn e li wir bi çi behna xwe vekin? Ma merive hertim li yahûdîyan bidin? Bive neve meriv e biçe xaneke û bîlardoye bilîze. Ji ber ve yeke jî, dive meriv lîstika bîlardoye bizani be! Ev baş keti bû sere min. Bi daxwazek bepîvan min dil hebû. Zûrîn bi dengekî bilind tirs li min difirand, di demeke wusa kurt de H hember ve destbikeriya min behitî dima. Piştî çend dersan peşniyar kir ku em li ser pera bilîzin. Hijmarek bi nîv kapikî. Ne ji bo peran, le lîstika vikûvala xwîyekî pir xirab e, digot. Min ev peşniyara jî pejirand. Zûrîn ji bo xwe pûnç xwest û ji min re got; dive tu careke viya biceribînî. Li gor wî, diviya bû meriv li leşgeriye xwe hînî vexwarina pûnçe bikira. Leşgerî be pûnç ne dibû! Min bi ya wî kir. Ê me lîstika xwe domand. Her ku min meya xwe qum dikir, wer li min zedetir

dibû. Ez behîş serxweş keti bûm. Ez wusa dilîstim ku serî çare gogen min di ser qeraxen mase re dipengizîn der. Ez hers dibûm, marqeçiyê ku dihejmart Xwede dizane be min çawa gef le dixwar û min lîstik mezin dikir. Bi kurtî, tevgeren min bû bûn wek yen zarokekî beradayî. Zûrîn careke li saete nehirî, goga bîlardoye danî û ji min re got; sed rûbil ji te çû. Ez bi viya hinekî behitî mam. Lewra pere min li ba Save-lyîç bû. Min kir ku ez bibejim li min bibore, le wî peyva min birî û got:

- Xaheş dikim, tew ne hewce ye ku hûn xwe nerihet bikin.

Ez dikarim bipem. Rabe em naha biçin ba Arînûşkaye.

Ku hûn di dewsa min de buyana we e çi bikira? Çawa ku min dest bi roje kir, min wusa jî qedand. Me şîva evare li ba 17

Arînûşkaye xwar. Zûrîn, pîyala min her dadigirt û digot; dive meriv xwe hînî leşgeriyê bikin. Dema ez ji ser mase rabûm, bi dijwarî li ser lingan disekinîm. Nîve şeve em veşkeriyên xane.

Li ser pelikan Savelyîç rastî me hat. Dema ku nişanen berbiçavî yen vatiniya leşgerî di min dît, bi dengekî kelagirî naliya û got:

- Çi bû bi te, Pyotr Andreyîç? Te li kudere wusa vexwar?

Ax, Xwedeyo! Ma gunehkariya min çi bû?

Min xwe rakeşande û wek bersiv göte:

- Deng meke, hulhulî! Tu serxweşî çî ye... Biçe bixewe, le bere tu min teke xew.

Sibetire ez bi sereş şiyar bûm û min bûyeren roja bere di nava mijê de bi bîr dihanî. Savelyîçe ku bi kasîkek çay kete hundur, ez ji van ramanan kirim, sere xwe hejand û got:

- Te gelekî zû dest bi kefkirine kir, Pyotr Andreyîç. Te xwiye ke girtiye, gelo? Ne kale te meyxur bû ne jî bave te. Diya te, ji xwe peyv U ser naye gotin, ji bûyina xwe heta îro ji kvaste(\*) pe ve tu meyeke din ne tamandiye. Baş e, le nerinde van hemî tiştan kî ye? Ew mîsyoye çavrijiya! Serî gave bazdida cem Antîpyevnaye û digot: «Madam, Je vu pri, vodka»(\*\*) A ji te re «Je vu pri» Ji Xwede re, tiştên baş da hînkirin, sege segbav!... Tu dibe qeye çor ketiye merive efendiye min û kes ne maye. De ka mamostetiya bavfile î xelke bi kerî çî hat!

Min şerm kir. Min bere xwe di hela din de kir û got:

- Derkeve der, Savelyîç. Min çay nave.

Le ku Savelyîç careke dest bi pilepile bikira, edî ne dihat sekinandin.

- Dawiya kefkirine va ye tu bi xwe dibînî, Pyotr Andreyîç, got. Sereşeke bi te girtiye û dile te naçe xwarine. Yekî ku vebixwe, tu tiştêkî din le naye. Naha dive tu bi hunguv hinek ava tirşîye vexwî. An jî dibe ku nîv pîyal nastoyka baştir be, ne (\*) Kvast: Şîreyek ûris e.

(\*\*) Madam, je vu pri, vodka: Xatunxan, ji kerema xwe re bi-nek, vodka.

18

vvusa? Ez bînim?

Di ve navbere de zarokek kete hundur. Perçekek kaxiz direjî min kir. Min vekir û ev rezikana xwend.

«PyotrAndreyîçe heja, ew sed rûbile ku do di lîstike deji we çû, bi vîzarokîreji min re bişîne. Ez gelekî desteng im.

Hertim dixizmeta we de

Îvan Zûrîn»

Tiştêkî ku bihata kirin tunebû. Mîna ku ez tew guhe xwe nedime, vegeyriyam ser Savelyîç î birevebire pere, kine û karûbaren min bû. Min je re got; sed rûbilîbide zarokî.

Ziman di deve Savelyîç de li hev geriya û bi mitûmatî pirsî:

- Çi? Hi? Cima?

Heta ku ji min hat, bi xwînsarî min bersiv da û got:

- Ez dayndare wî me.

Her ku diçû, matmayîna Savelyîç le zede dibû û bi dengekî bilind got:

- Deyndare çi! Ka tu kengîbûy deyndare wî, ezbenî? Ev çi kar e! Tu û kefa xwe, le ez pera nadim, ezbenî.

Xwe bi xwe fikirim û min got: Di ve rewşe de ku ez peşîye li vî kale serhişk negirem, dûre ez e nikari bim hefsare xwe ji deste wî bifîlitînim. Loma jî min wusa ji jor de bala xwe daye ûgot:

- Ez efendî me û tu jî xulame min î. Pere, pere min e. Ji ber ku dile min wusa xwest, min ew di lîstike de wenda kirin. Ji dela aqilmendiye ve, kare ku ji te re te gotin, bike.

Savelyîç di ciye xwe de sipûsar bû, desten xwe li hev da û wusa ma. Ez bi hers di ser de qeriyam:

- Çi sekiniye, tu!

Savelyîç dest bi giri kir û bi dengekî lertzok:

- Pyotr Andreyîç, got, roniya çave min. Min ne qahirine ez bi gorne. Ka tu were guh bide vî pîremerî û ji wî felbazî re binivise û bibeje: Min henek kiriye, me ewqas pere nine. Sed rûbil! Xwedeyo! Je re bibeje: De û bave min lîstika li ser pera ji min re qedexe kiriye, le li ser gvîzan dikarim bilîzim...

Bi dengekî tûj û bilind min peyva wî biri û got:

- Devji galegalen tewş berde û zû wan pera werîne! An ne,

19

ez dizanim be ez e çawa bi şilika hustuye te bigirem û bavejim derve.

Kelagirî li gewriya Savelyîç piçikî, U min nehirî û dûre çû ku pera bîne. Dile min bi pîremere reben şewuti bû. Le min dixwest ez pe bidim zanîn ku ez edî ne zarok im û bigehim azadiya xwe.

Pere Zûrîn hate şandin. Savelyîç lez dikir ku bi gaveke zûtir min ji ve xana beyom derxîne. Hat û got; taxûk amade ye. Beyî ez ji mamoste xwe î bîlardoye xatir bixwazim û bifikirim ku ez e rojêke rastî wî bem; bi eşek nependî û poşmaniyek bedeng, ez ji Simbîrske qetiyam.

20

-IIREBER

Ey welate dÛr û xweşik

Ey welateji bo min biyanî!

Ne bi daxwaza dilexwe hatim vir

Ûnejîli serpiştê kehelexwe.

Agire xortaniye û mijdûmana meyxane

Evxorte diler, ango ez hanîme vedere.

«Sitraneke kevn»

Ew tiştên ku ez di re de li ser diramiyam, tew jî ne tiştne baş bûn. Pere ku ji min çû bû, li gor pîvana we çaxe ne pereke hindik bû. Kemaqiliya tevgera xwe ya li xane, min bedii U xwe dadihanî û min xwe U hemberî Savelyîç gunehkar hîs dikir. Ez xemxware van hemû tiştan bûm. Pîremer U keleka duruşkevan



rûnişti bû. Piştá xwe bi min de kiri bû û tene ji bo dehkirina hespan deve xwe ji hev dikir an jî dikire pilepil. Min dixwest bi awakî dile wî bigirem û bi wî re U hev werim, le min nizani bû ku ez e ji kudere dest pe bikim. Di dawiya dawîn de min göte:

- Savelyîç! De bes e edî, were em li hev ben. Li min bibore!  
Ez dipejirînim ku xeletiya min bû. Min do nerindî kir û be sedem min dile te şikand. Ez e söze bidime te ku ji vir û pe ve, ez e dîniya nekim. Ez e bi ya te bikim. De edî hers nebe, were em li hev werin.

Pîremer bi keserek kwîr:

- Ax ax, Pyotr Andreyîç! Ez, ji xwe hers dibim. Hemû xeletiya min bû. Min çawa tu bi tene li xane hiştî! Ax, ev sere min î ehmeq, ax! Min bi ya şeyten kir û ez çûm serledana jina  
21

zangoç. Ji dûr ve meriva min te... û herweha ev tiştá di sere min de hat! Uf uf!... Ez e naha bi çi ruyî li efendiye xwe bi-nerim? Dema ku bibîhizin küre wan bi qumare dilîze û meye vedixwe, ew e çi bibejin?

Ji bo ku ez Savelyîçe reben bmewînim, min gelek göte û min soz daye ku ez e ji vir û weha be gotina wî kapikekî xerc nekim. Carina sere xwe dihejand û xwe bi xwe:

- Sed rûbil! Ne hindik e! digot û dikir pilepil. Le dûre behna wî fere bû.

Navçeye ku ez e biçûwama, me nezîkî le kiri bû. Bi mit û geliyen xwe, beyarek behntengîn li hawirdora min dûr û direj dibû. Her dever bi berfe nixumî bû. Ro U ber ava bû. Taxûka me li ser reyek teng bi peş de diçû, bi gotinek rastir, H ser

sopa taxûken gundiyan bû. Duruşkevan ji nişka ve li ser piye xwe î çepe nehirî, dûre küme xwe ji sere xwe danî û zivirî ser min:

- Bi destûre we em bi şûnde vegeriyana, ezbenî!

-Cima?

- Dine ne xweş xuyaye. Her ku diçe ba jî zede radibe... Ca binerin be çawa diborizîne!

- Xem nake, ewqas jî dibe!

- Ca li wir binerin, li wir... Ma hûn nabînin be çi dibe? got û bi şivdare xwe hela rohilat peşan dida.

- Ji bilî deşta sipî û asimane sayî ez tişteki nabînim.

- Ca li wî... li wî ewre piçûk binerin.

Bi rastî jî li ser xetika bandevve, sipîewrekî piçûk bi ber çave min ket. Bi meyizînek peşîn re, meriv digot qeye girek e û li dûr e. Duruşkevan ji min re digot; ev renege hatina pûkeke ye.

Li ser pûken vî navçeyî, min bere Ýlinek tişt bihîsti bûn.

Min dizani bû ku U vir duruşke, çawa tev bare xwe di bine berfe de mane. Savelyîç jî U ser fikra duruşkevan bû û dixwest em bi şûnde vegerin. Le bi ya min, ba ne ewqas dijwar bû. Bi heviya ku beriya pûke em xwe bigihînin guzergeheke peş, min ferman da duruşkevan ku bilezîne.

Merik hesp rakirin çargaviya, le çave wî her li rohilat bû.

22

Hesp weke talaza diçûn. Di ve navbere de her ku diçû, ba zedetir radibû. Ew ewre piçûk fere bû, fere bû û bû dûmanek sipî. Dûre ber bi jor li hev geriya, mezin bû û hedî hedî li heme ruye asiman belav bû. Bere, berfe hedî hedî ditozand û

dûre ji nişka ve dest pe kir û kulî bi kulî dahat. Bayî duguvguvand û kuliyen berfe li ba dikir. Asiman di demeke kurt de tarî bû bû û bi rûbendek berfa şîlo hati bû nixumandin. Roniya çavan peş xwe ne didît.

Duruşkevan dengê hilda û got:

- Bele, ezbenî! Malik li me şevvutî, pûk!...

Min sere xwe di taxûke re dendst û nehirî; Tariyek ripûreş bû. Pûke wek perçen şûşan diborizand serçave meriv. Bayî bi har û hewarek wusa difîkand ku meriv digot qeye kûrîna hezar lavvîran e. Li ser min û Savelyîç lep bi lep berf dadihat.

Hesp ji çargaviyan keti bûn û dûre jî ravvestiyan.

Betewatî ez di ser duruşkevan de qerîyam û min göte:

- Tu cima najoy?

Duruşkevan:

- Ez bi kudere de bajom, got û ji taxûke daket xware\ Xwede dizane be em li kudere ne. Ne re û ne jî şop xuyaye. Hawirdora me mij û duman e.

Min dest pe kir û je re peyven xirab gotin. Le Savelyîç li pişta wî rabû û bi enirin got:

- Diviya bû te bi ya me bikira, ezbenî. Ma xirab bû ku em veqeriyana xane, te çayek germ vexwara û heta sibe xewa xwe bigirta? Ew e pûke xwe ragirta û dûre jî em e teketana riya xwe. Em bi kudere de wusa dilezmin? Ma em diçin dîlane!...

Savelyîç rast digot. Le tişte ku bihata kirin ne ma bû edî.

Bi beran berf dadihat xware û her ku diçû li dor taxûke berztir dibû. Sere hespan keti bû ber wan, di cî de rawestiya bûn û carina jî diricifîn. Duruşkevan li derûdora duruşke diçû dihat, ji ber ku nizani bû çî bikira, her kilawen hespan

serast dikir. Savelyîç xwe bi xwe dikir pilepil. Bi heviya ku çav li avahiyeke an copa reyeke bixinim, min li hawirdora xwe di-neri. Ji bilîbagerek ximamî, min tişteke ji hev dernedixist. Le ji nişka ve reşikek bi ber çave min ket.

23

Min bi dengekî ban kir û got:

- Ero duruşkevan, ca binere, ew reşika çi ye li we dûre dilive?

Duruşkevan nehirî, dûre hilkişiya jor li tiye xwe rûnişt û got:

- Xwede dizane be çi ye, ezbenî. Taxûk nine, bibejim dar e... ne ew e jî. Le bi rastî jî tişteke li wir dilive. Dibe ku gur an jî merivek be.

Min ferman da duruşkevan ku ber bi wir bajo. Ew reşika jî ber bi me liviya. Piştî du deqan em güüştin hev. Ev merivek bû.

Duruşkevan dengê le hilda û got:

- Ero, mSrike dilovan! Ma tu nizanîbe re li kuderâ ye?

Rewî bersiv da û got:

- Re li vir e, di bine lingen min de ye. Cima?

Min göte:

- Ca bibeje, ka tu van derina dinasî? Me heta xaneke bibe.

Rewî ezbersivandim û got:

- Ez van derina dinasim. Ez gav bi gav li van derina geriyame.

Le ma tu nabînî be dine çawa ye? Meriv tavile riya xwe wenda dike. Ya baştirîn ev e ku heta bager xwe radgire û ewr vebike, em li vir ravvestin. We çaxe em e di ronahiya siterkan de tekevin re.

Bi ve behnfereyîya merik ez jî werek bû bûm. Min biryara

xwe dabû ku ez li ve rasta beyare xwe bisiperim Xwede û şevder bimînim. Rewiye me xwe ji nişka ve pengizand jor û h keleka duruşkevan rûnişt.

- Ero, got, dive gund ji vir ewqas ne dûr be. Bere hespan li ser piye raste bizivirîne û bajo.

Ev liva wî bi duruşkevan xweş ne hati bû. Ji ber ve yeke jî:

- Cima ezeli ser piye raste bajom? got. Ka re li kudere' ye? Le ne xema te ye, ne hesp hespen te û ne jî kilawe kilawen te ne.

Bi min wusa xuya bû ku duruşkevan rastir bû. Min jî:

- Ere wusa ye, got. Ma tu çawa dizanî ku gund ji vir ne dûr e?

Rewîbersiv da û got:

24

- Ji ber ku ba ji we hele te û behna dûkele te poze min. Ev jî dide diyarkirin ku dive gund ji vir ne dûr be.

Ez li ve deqdoriya merik behitî ma bûm. Min ferman da duruşkevan ku bajo. Di ve berfe de hespan bi dijwarî gav dihavetin û bi peş de diçûn. Duruşke gav li besûyen berfe ase dibû, gav li kortikan rast dihat. Li vî aliyê û wî aliyê dihejiya û hedî hedî bi peş de diçû. Mîna şextûrek ku di nav deryayek pelrabûyî de be. Savelyîç li hemberî min rûniştî bû, dinaliya û dihejiya. Min digot qeye ew e aniha û aniha bi ser min de ger be. Min perdezfîna deri daxist xware û kûrke xwe baş li xwe peça. Duruşka ku hedî hedî bi re keti bû, weke dergûşeke ez hejandim û ûveûva bagerS di guhen min de bû nola lorîneke sitrane û ez pe ketim xewe.

Min xewnek dît û ez e U dare dine tu carî nikari bim ji bîr

bikim. Iro jî dema ez we bi bîr tînim, tevî ew hemû bûyeren ku dûre di sere min de hatin, wek tiştêkî pexemberane bû ev. Bila xwendevan li min bibore. Lewra ew dizanin ku meriv çiqas ji tiştên batini şik bike jî, meriv e dîsa ber bi baye tiştên wusa bikeve. Di we dema beriya xewe de rewşeke wusa dibe ku, rastî li nav xewne dikeve û pe ve dikele. Ê ez jî di revşek wusa de bûm. Min didît ku bagere hej bi har û hewartiya xwe diborizand, em jî li ve çola berfa be ser û be dawî, U vî aüyî û wî ahyî digeriyên. Ji nişka ve deriyek bi min ve xuya bû û em ketin hundure hevşê wargeha me. Tirsê ku peşîye U min rabû; min digot bave min e li min hers be ku ez be destur vegeyîyame

male û ew e bibeje ev serhişkî ye. Bi tirsê ez ji taxûke daketim xware. Min nehirî ku diya min li ser pelikan li bende min e. Xweş diyar bû ku ew xemgîn bû.

«- Hişş, hedî hedî, dibeje. Bave te H ber mirine ye û dixwaze şîrhelaliye li te bike.» Ez bi tirsê didim pey we. Em derbasî oda raketine dibin. Ode, bi ronahiyeke pir kem e. Li ber ci- lan, bi ruyên xemgîn merivina rawestine. Ez bedeng ber bi ci- lan diçim. Diya min peşmayîye hedîka ji ser lihefe radike û dibe: «Andrey Petrovîç, ca binere Petrûşa hatiye. Nexweşîya te bihîstîye û loma bi şûnde vegeyîyaye. Rabe, je re lava sitariye bike.» Ez li ser çogan xwe didim erde û req U nexweş di-

25

nerim. Ê ez çî bibînim?... Ji dela ve bave min, gundiyeke rîfeş di nava lihefan de direjkirî ye û bi rûkenî li min dimeyize. Ez tiştêkî tenagehîjim û dizivirim ser diya xwe: «Ev çî ye?» dibejim. Ev ne bave min e. Ê ez ji gundiyeke dixwazim ku lava sitariye

li min bike?» Diya min bersive dide min û dibeje: «Xem nake, Petrûşa! Ew şoşpane(\*) te ye. Ca tu deste wî maçî bike, bila lava xere li te bike.» Ez bi viya qayfl nabim. Ê we çaxe jî gundî ji nava cilan dipengize, ji paş piştta xwe kereke dikeşîhe û li derûdora xwe li ba dike. Ez dixwazim bazdim, le ez nikarim. Ode ji miriyan tijî ye. Lingen min ber Ýaşen wan dikeve, li ser xwînen rijiyayî diterişim... Gundiye xeternak di ve navbere de bi dostanî banî min dike û dibe: « Netirse, were xwe baveje bexte min, ez lava xere li te bikim.» Tirs û xof li min rabûye û ez mame behitî...

Di we gave de ez şiyar bûm. Hesp rawestiya bûn. Savelyîç bi piye min girti bû, kaş dikir û digot:

- Em hatin Pyotr Andreyîç, dakeve.

Min çave xwe mist dan û got:

- Em hatin kudere?

- Em hatin ber xane. Xwede li ruye me meyizî û em rasterast hatin ber dîware hewşe. Rabe zû dakeve xware û biçê hundur xwe germ bike.

Ez ji duruşke daketim. Bagere xwe hinekî ragirti bû, le hej didomiya. Dine wusa tarî bû ku çav çavan ne didît. Xwediye xane li ber derî bergitî me hat. Fanosek dabû talda peşa xwe. Odekek piçûk le gelek paqij, nişanî min da. Çilayeke ev der rohnî dikir. Tivingek, û kolozekî bilind î kazakî bi dîwer ve dardekirî bûn.

Xwediye xane ji kazaken ûralî bû. Gundiyeke li dor şestsale dixuya, le hej sax û li ser xwe bû. Savelyîç jî valize rewîtiye girt û li pey min hat. Ji bo kelandina ava çaye, ji xwediye xane agir xwest. Ez dibejim qeye di jiyana min de heta naha tu carî dile

(\*) Êrisiya we -posajyonniy atyets - e. Kesîku di zewace deji bûki re an jîji zavi re baviye dike. Di tirkî de tişteki wek - sađ-dýç - tegotin. Êmejipeyva - şoşpan - bi karhanî.

26

min ewqas çay ne xwesti bû. Xwediye xane çû ku ve daxwaze bi cî bîne.

Min ji Savelyîç pirsî û got:

- Ka rebere me li kudere ye?

Ji jor dengê berz bû û got:

- Ez li vir im, ezbenî.

Min bere xwe ber bi hela deng kir, li ser sekûka ergûn çave min bi rîyekî reş û du çaven birîqî ket.

- Ew çi ye, birako? Na xwe te sar e?

- Ma meriv bi bertena betanekî tenik naqefile? Qutikekî min hebû, ez çi derewan bikim, min ew jî U ba xwedîye meyxane girûganî danî. Min bawer ne dikir ku ew e sarsayiyek wusa dijjvar bibe.

Di we gave de xwediye xane bi semawerek ava keliyayî kete hundur. Min rebere me vexund ku kasikek çaya germ vexwe. Merik ji ser sekûke dakete xware. Xwedî bejnûbalek balkeş bû. Li dor çelsalî dixuya. Ne kin û ne direj bû. Navpiye wî fere le jar bû. Cî bi cî tayen sipî keti bûn riye wî ye reş. Çaven wî yen gir û xweş, dilîzikîn. Ruye wî serîn, le xapînokî jî dixuya. Pore wî di dore re hati bû çekilin. Xeftanekî qertûî û şalwarekî tatarî le bû. Min kasikek çay ber bi wî direj kir. Sekini, mirûz li xwe tirşand û got:

- Efendiye min, bibejin ku bila pîyalek seraba sor bîhin. Ji bo me kazakan, çay qet ne tişteki e.



Min bi kefxweşî ev daxwaza wî bi cî hanî. Xwediye xane ji kungîşûşekê û pîyalek derxist û ber bi merik hat. Çer ku çav li ruye wî xist, got:

- Wey, tu dîsa li vir î, ere! Tu ji kudere de tey?

Rebere min, bi mane je re çave xwe şikand û bi metelokeye bersiva wî da:

- Ez di ser bîstan re difiriyam, min werîs nikul dikir, pîrike kevirek havet, kevir di ber min re derbas bû. Eee...! Li ba we çi dengûbahs?

- De çi hebe? Ji bo lava evare ew e jama dere lexistana le jina metran ne hişt, metran çû mevaniye, li goristana dere şeytan dişerin.

27

Çîprûte min li hember derket û got:

- Deng meke, apo! Ku baran bibare ew e kuvarik jî derkevin, ku kuvarik derkevin ew e zembil jî peyda bibe. Aniha tu ewk bike... (Li vir dîsa çave xwe şikand) nalcixe xwe di ber piştta xwe re bike. Parezger dişerin.

Di dawiyê re:

- Noş, efendiye min! got û bi gunehweşîn rahişt pîyale û bi careke de vala kir. Dûre xwar bû, silav li min hilda û dîsa vegeriya çû ser sekûke.

Ji vî zimane çûçike ku ew pe bi hev re peyivîn, min tew tiştê ne fahmî we çaxe. Le dûre ez tegehîştîm ku mijar li ser serhildana kazaken ûralî (1772) bû. Savelyîç baş guhe xwe li qisedana wan ragirti bû. Bi çavekî şikî gav li gundî û gav li xwediye xane dimeyîzî. Xan jî li rasta destek bedeng, ji hemû avahiyîn gundan dîr û li ciyekî sape bû. Rasterast wek warekî

çapûlgeran bû. Le edî tişte ku bihata kirin tunebû. Meriv nikari bû teketa re û bidomanda jî. Nerihetiya Savelyîç ez kefxweş dikirim. Min xwe li ser text ramedand ku ez şeve li vir derbas bikim. Savelyîç vekîşiya ber ergûn, û xwediye xane xwe li erde direj kir. Piştî demeke, pixînek keti bû ser ode û ez jî ketim xeweke giran.

Sibetire piştî ku ez gelekî dereng şiyar bûm, bager sekinî bû. Ro hilati bû. Beyara be ser û be dawî, ji berfa wek rûbendek sipî nixumî bû û çaven meriv ji ber venedi bûn. Hesp bi duruşke ve hati bûn şidandin. Min pere xwediye xane da. Merik perekî ewqas bi pîvan ji me girt ku, Savelyîç jîwek hertimî ne peyivî û ne jî ket heftûheşte. Ew şiken wî yen do jî hemû ji sere wî derketin. Min banî rebere me kir û ji bo alîkariya avî min sipasî le kir. Ez vegeriyam ser Savelyîç û min je re got; ji bo şerabe pençe kapikî bide wî. Pîremer mirûz U xwe tirşand û got:

- Pençe kapik ji bo şerabe! Cima? An me heta xane ew bi taxûka xwe hanî, loma? Tu bi kefa xwe î ezbenî, le pençe kapike me î zede tüne ku em bidin. Ku meriv ji bo şerabe pençe kapikî bidî herkesî, we çaxe meriv e bi xwe ji birçîha bimire. Ez zede nikari bûm di ser Savelyîç de biçûwama. Li gor

28

soza min û wî, li ser hemû pere min ew xwedîbiryar bû. Le ji heleke ve jî behna min teng bû bû. Lewra min nikari bû çeyiya xwe nişanî merivekî bida, merivekî ku ez xelas kiri bûm. Dibe ku ev xelasiya ne ji mirineke bû, le dîsa jî ji rewşeke teng bû.

Beyî ku ez li xwe bigirem, min got:

- Baş e, ku tu naxwazî pençe kapike bidî, we çaxe ji bo wî kincekî min dendne. Ew bertena kincen tenik e. Kurkâ min î ji poste kevroşik bide wî.

Savelyîç bi nalîn got:

- Ji bo Xwede, Pyotr Andreyîç! Ez tem dest û lingen te! Maji bo çi ez e kürke te î ji poste kevroşik bidim wî? Ew e tavile biçe meyxaneke bifroşe û bi wan peran xwe sermest bike.

Çîprûte min got:

- Ku ez bifiroşim û bi wî pereyî xwe sermest bikim nekim, çi bi te ketiye? Kale hulhulî! Efendiye me kerem dike û kürke navpiye xwe dide min. Ev daxwaza dile mîran e. Peyivîh bi kevnêkî xulame nola te nakeve! Tişte ku ji te te xwestin, tu wî bi cî bîne.

Savelyîç bi dengekî xeyidok bersiv da û got:

- Ma tu ji Xwede natirsî, çapûlger! Tu dizanî ku hîna hişe lewik di ber tişteki de naçe. Kefa te ji naştîtiya wî re te û tu dixwazî wî şirop bikî, ne wusa? Tu û kürke mîrekî! Tew ev li navpiye te îxilûxwar jî nabe. Çavrijiya!

Minji lalaye xwe re got:

- Zimandirejiya meke, naha! Zû wî kurkîbîne vir!

Savelyîç dîsa bi nalîn got:

- Xwedeyo, tu mezin î! Kürk hîha nipûnû ye. Merive ku tu didîwîjî, naha meriv ba! Meyxur û çîprûtek e!

Bi ve yeke re kürke ji poste kevroşik jî derketi bû raste. Li wir gundî ew tavile li xwe kişand û ceriband. Kürke ku ji min re jî hinekî piçûk bû bû, ji bo wî pir û pir piçûk bû. Le bi dijwarî be jî merik li xwe kir, heta ku çend cî je bişkuvand.

Denge çirîna bisküvine diçû Savelyîç û kelagirî li gewriya wî

piçikîbû.

Sersere ji ve xelata min gelek kefxweş bû bû. Heta ber du-  
29

ruşke bi min re rast bû, dûre heta nave xwe xwar kir û got:  
- Ez sipas dikim, ezbenî! Xwede ji we razî be! Ez e li dare  
dine, tew ve çeyiya we ji bîr nekim!

Wî da ser riya xwe û beyî ku ez guhe xwe bidim xemgîniya  
Savelyîç, min jî xwe havet duruşka xwe. Ê piştî demeke, min  
bagera do, rebere xwe û kûrke ji poste kevrosîk ji bîr kiri bû  
jî-

Dema ku ez ghiştîm Orenbûrge, rasterast çûm ba general.  
Merivekî bejndirej bû. Le ji ber pîrbûne piştî wî xuz bû bû  
edî. Pore wî ye direj bi tevayî sipî bû bû. Üniforma wî ya kevn  
û rengxewirî, seren dewra Ann Yoannovnaye bi bîra meriv  
dihanî. Peyivîha wî bi zarhişkiya almanî bû. Nama ku bave  
min nivisî bû, min da wî. Çer ku çav bi nave bave min ket, hinekî  
weha nehirî û:

- Xwedeyo! got. Ma di ser xortaniya Andrey Petrovîç re  
çiqas wext derbas bû ku bûye bave xortekî wusa! Ax, wext!  
Wext!

Dûre name vekir, bi dengê nivçe dest bi xwendine kir û  
di nav re jî dîtinen xwe digot.

«Andrey Karlovîç î dewletmend! Hevîdar im ku efendiye  
me î şerefmend...» Ev çi seremoni ye? Ca le binere, şerm jî  
nake! Ere, sere hertiştî dîsîplîn e, le ma meriv ji kameradekî  
xwe î kevn re jî weha dinivise?... «Efendiye me ji bîr ne kiri-  
ne...» Him... «Ê...bi... rihmetî feld-mereşal Munn... re... di  
riya... Karolinchene de...» Oho brûder! Heşaşiyen me yen

xortaniye hîna di bîra wî de ne; «Em werin ser mijara xwe ya bingehîn... Ez e tolaze xwe ji we re.» Him... «Tev serûpe ji we re.» Wusa xuyaye ev metelokek ûrisan e. Mana we çi ye? got û vegeriya ser min.

- Tev serûpe ji we re, te çi mane? got û pirsar xwe duçar kir.

Heta ku ji deste min hat, min xwe li nezaniye danî û got:

- Tev serûpe ji we re, ango mana we ev ku; wek çaven xwe lenehirîn, ne qirqilandin, tera xwe serbestberdan e.

- Him... ez tedigehîjim... «Û wî zede beradayî nehele...»

Na, tev serûpe ji we re, ne di we mane de ye. «Di ve navbere 30

de... şinasnama wî...» Ka ew li kudere ye? Hi, va ye... «Li alayiya Semyonovske binivisîne...» Baş e, baş e. Ew e hemû bibe... «Û dûre wek hevalbend û dostekî xwe î kevn, bihelin ku ez we ji dil hemez bikim.» Hi! Mala te ava!... û henvekî din... û henvekî din...

Piştî ku generel name xwend qedand, şinasnama min da heleke û got:

- Bele xorto! Ev daxwazen bave te e hemû jî bi cî werin.

Tu e wek efserekî biçî alayiya \* \* \* . Û ji bo ku wexta te wenda nebe, tu e sibe bere xwe bidî kela Belogorske. Li wir tu e biçî ber desteMîronovî kapîtanMerivekî baş û dilpak e... Tu e H wir hînî leşgeriyek rastkîno û disipline bibî. Tew ne hewce ye ku tu li Orenbûrge bimînî. Ji bo xortekî, tolazî û beradayitî ne tiştê baş e. Le ji bo xwarina şîve, îro li ba min bimîne, ere!

Xwe bi xwe fikirîm û min di dile xwe de got:

«Bi rastîjî her ku diçe, xirabtir dibe. De ka bi kerî çi hat ku

ez di zike diya xwe de li heza parezger wek grûhbanekî hati-  
me nivisîn? Ka çi xwelî H sere min kir? Alayiya \*\*\* li ser merize  
kîrgîz, li kelakek melûl e!...

Min û Andrey Karlovîç û fermanbere wî î pîr, me bi hev re  
şîv xwar. Bexûî û destgirtiya wî ji masa wî diyar bû. Ez wer  
bawer im ku general ne dixwest li texte nane wî î ezeb, mevanekî  
din jî zede bibe. Ê ji ber ve yeke jî, dixwest rojeke zûtir  
bere min bide riya garnîzone. Sibetira roje min dilxweşîji ge-  
neral xwest û ez ketim riya wî tiye ku hati bû gotin.

31

-IIKELA

Em leşgeren ve kele ne

Xwarina me nan, vexwarina me av e.

Fermo, bila werin neyarin me

Raxistiyaji bo wan texte nane me:

Ji bo xerhatina wan,

Me gulûle hene li ber deve topan!

«Sitranek leşgeran»

Meriven heyame kevn in, ezbenî!

«Bexe diya xwe»

Kela Belogorske bi qasî çel verstan(\*) ji Orenbûrge dûr

bû. Re, di berî berî geliyen qeraxe ceme Êral re diçû. Çem

hej cemed ne girti bû. Qeraxe çem di şîpeke de bi berfa sipe

nixumî bû. Pelen xulavî di nav de xemgîn xemgîn reş dixuyan,

U palen beyaren kîrgîz pan dibûn û diçûn. Ez keti bûm nava

ramanen xemgîn. Edî jîyana garnîzone bala min ne dikeşa.

Min Mîronov î kapîtan dihanî ber çave xwe, min digot ev kapîtane

min merviekî pîr, hişk, hersok û ji bilî vatiniya xwe tew

tişteki nafikire, ku kemasiya min î herî piçûk jî bibine, ew e min baveje baş deriye nanrijiye. Di ve navbere de tariye xwe berda bû ruye erde. Duruşkevan bi lezek xweş dajot.

Minjepirsîûgot:

- Maji kele re hej pir maye?

Merik:

- Na, got. Va ye li peş me duxuye.

(\*) Verst: 1066mîtroyen îroyîn e.

32

Bi heviya ku ez e bend, bire û sengeren kele bibînim, min U dor xwe nehîrî. Le ji bilî gundekî ku ji qurmen daran dorgirtî min tu tişteki ne didît. Li aliyekî re, se an jî çar dizên giye hebûn, sere wan berf girti bûn. Li aliye din jî aşekî bayî hebû, pervvanen we reben reben daketi bûn.

Bi revvşeke behitî min pirsî û got:

- Ka kele li kudere ye?

Duruşkevan ew günde piçûk peşan da û:

- A, kele ev e, got û em bi ve gotine re ketin hundure we.

Ji hesine hetûnî topeke kevn U ber deri bû. Em di kuçên teng û xilûxwarî re derbas bûn. Xanî nizm bûn û piri wan banen wan bi kaye nixumandî bûn. Min ferman da duruşkevan ku min bibe ba femandar. Ê piştî lehzeke taxûk li ber xaniyekî piçûkî textîn sekinî. Li ser girekî nezîkî dere bû. Der jî textîn bû.

Kesek derneket û bergitî min ne hat. Ez derbasî peş eywane bûm û min derî vekir. Leşgerekî bisal li ber mase rûniştî bû, pînekî heşîn girti bû destê xwe û bi enîşka unîformek kesk ve pîne dikir. Min je xwest ku hatina min ji jor re bibeje.

Leşgere bisal:

- Tekeve hundur canekem, got, yen me ü mal in.

Min gav kir û ez ketim odekek xweş û piçûk. Bi awayeke kevnare hati bû raxistin. Li quncikekî dolabek ferûfola hebû. Dîplomekek efseriye bi cam û çarçove, bi dîwer ve dardekirî bû. Çend tabloyen sifýken ku li keleka we bûn, desthilatkirina Kîstrîn û Oçakove, xwazgîniyen keçeke û binaxkirina pisikeke dida xuyakirin. Li ber pencere jinikek pîr rûnişti bû. Bi serpuş bû û fanoliyekî herî li navpiye we bû. Pîremerekî yekçav û bi üniforma leşgerî li peşberî we rûnişti bû. Gulokek rîs U piye wî gerandî bû û jinik xerikî hilkirina we bû.

Beyî ku kare xwe rawestîne jinike pirsî û got:

- We çî dive, ezbenî?

Min bersivand û göte; ez hatime vir leşgeriya xwe bikim û ji ber ve yeke min dixwest ez kapîtan bibînim. Ê bi ve gotina xwe re min kir ku ez vegerim ser wî efsere yekçav. Lewra ji min kira kapîtan ew bi xwe bû. Le kevvaniya male ew gotara

ku her min di dile xwe de dubare fikir, birî û:

- Ivan Kûzmîç ne li mal e, got. Çûye mevandariya Gerasîm î metran. Le tişteke nabe, ez jina wî me. Hûn bi xerûxweşî hatin! Kerem bikin û rûnin, ezbenî.

Dûre dengê li destirmanana xwe hilda ku biçê banî grûhbane kazak bike. Efsere pîr bi fera çave xwe zîq li min nehirî û got:

- Ma ez dikarim bipirsim ku hûn ji kîjan alayiye hatine? Ê ji ber çî sedemî hûn ji alayiye şandine kele?

Wek bersiv min le vegerand û je re got; femandariye weha



çetir dîtiye, loma.

Pirsgerme ku ne diwestiya;

- Ez bawer im ji ber tevgeren we yen ku bi efserekî alayîye nakeve... got û kir ku bidomîne, le jina kapîtan:

- Dev ji zimandirejîya xwe berde. Tu dibîhî ku xort ji re vvestyayî ye. Veca kare wî tüne, bi te re tekeve heftûheşte... van piyen xwe jî rast bike, got û vejeriya ser min:

- Ezbenî, tu jî tew di ber de xeman nexwe û nebeje; wan ez havetime vî tiye melûl. Ji wan kesen ku ten vir, tu, ne ye peşîn û ne jî ye dawîn î. Ku meriv hinekî behna xwe fere bike, meriv hînî vir dibe û tew je kefxweş jî dibe. Ji ber ku xwînek keti bû hustuye Şvabrîn Aleksey Ivanîç, penc sal bere ew şandý bûn vir. Xwede dizane be çî di dile wî de hebûye. Le bi sutvanekî ve çûne derveyî bajar û sûren wan jî bi wan re... Dûre jî rabûne hev û bi hev ketine. Aleksey Ivanîç sutvan kuştîye û tew li ber çaven du dîdevanan! Ev jîweha bûye, ere le.

Di ve navbere de grûhban ket hundur. Xortekî kazak î bi dest û pe bû. Jina kapîtan je re got:

- Maksîmîç! Efendî U maleke paqij bi cî bike.

Grûhban bersiv da û:

- Serçavan, Vasûîsa Yegorovna, got. Ku ez wan li mala îvan Polejayev bi cî bikim, çawa dibe?

Jina kapîtan got:

- Maksîmîç, tu tew nizanî be tu çî dibejî. Mala Polejayev ji xwe tera xwe tevlihev e. Ji bo mîrza odeke peyda bike. Efendî bibe... Mîrza efendî, nav û paşnave we çî bû, ezbenî? Pyotr

34

Andreyîç, ne wusa?... Tu Pyotr Andreyîç bibe mala Semyon

Kûzov. Berûmete berûmet, çûye hespa xwe berdaye nav bîstane me. Eee Maksîmîç, hevîdar im tu nerihetiyek tune?

Kazak bersivand û got:

- Na, tişteki xam ne qewumiye. Le Prohorov î sercoxe li serşoke ji bo cirnek ava germ li Ûstînya Negûlîna xistiye.

Jina kapîten vegehiya ser efsere kwîr û got:

- îvan îgnatyîç! Prohorov û Ûstînya bikeşîne dadpirsiye û binere be kî heq û kî neheq e. Le herduyan jî biarihîne. De rabe, Maksîmîç! Pyotr Andreyîç, Maksîmîç e tiye we peşanî we bike.

Min silav da û ez derketim. Grûhban ez birim malek li keleka wî aliye kele. Li ser kendale bilind î çem hati bû avakirin.

Li heleke ode malbata Kûzov dima, hela din jî ji bo min hate raxistin. Odekek gelek paqij bû. Bi caxen textîn hati bû dubeşkirin.

Savelyîç xerîkî bicîkirina tiştên min bû. Min jî xwe li

keleka pencera kember da erde û li derve nehirî. Beyarek melankolik dûr û direj heta ku çaven meriv didît dixuya.

Çend malik li derûdore duxuyan û çend rîrîşk di kuçe de digeriyan.

Kurnek di dest jinek pîr de, li ser pelika ber mala

xwe rawestiya bû û banî berazen xwe dikir. Bi xûrexûrek dost-

tane wan jî bersiva we didan. Mixabin xortaniya min e U ciyekî

weha bibuhuriya! Diltengiyeye bi min girt, ez ji pencere

dûrketim û beyî ku ez şîve bixwim ez çûm ser lihefen xwe.

Bi xemxwarî Savelyîç xwe bi xwe digot:

- Xwedeyo, tu dizanî! Tew tişteki naxwe! Ku lawik nexweş bikeve, dûre xatûn e ji min re bibe çi?

Sibetire min dikir ku ez kincen xwe U xwe bikim, derî vebû

û efserekî xort ket hundur. Bejna wî kin, esmer û heta ku tu

bibe rûkereh bû. Le wusa xuya bû xorteke gelekî destsivik bû.  
Ji min re bi fransî got:

- Li min biborin ku ez weha behay hatim serledana we.

Hatina we min do bihîst. Bi rastî min ewqas dil hebû ez ruye  
merivekî bibînim ku, edî min nikari bû xwe bigirta. Ku hûn U  
vir bijîn, piştî demekî hûn e jî viya fahm bikin.

Ez tegihîştim ku ew efsere ji ber sedema duelloye ji

35

alayiye hati bû dîndstin, ev e. Wek du hevalbenden kevn, em  
tavile li hev xwîngermî bûn. Şvabrîn ne merivekî ehmeq bû.  
Xwediye qisedanek gjran û balkeş bû. Malbata fermander,  
nas û dosten dora wî, ev navçeye ku ez hatime şandin bi zimanekî  
xweş û şorgerm ji min re nigart. Di ve katkirina wî de  
dema jidil biqîneke bi min girt, deri vebû. Ew leşgere bisal î  
ku do li eyvvana mala fermander üniforma xwe pîne dikir, ket  
hundur. Da zanîn ku Vasflîsa Yegorovnaye ez vexundime taşte.  
Şvabrîn tavile biryara xwe da ku ew jî bi min re were.

Dema me nezîkî li mala fermander kir, me U qadek piçûk  
bi qasî bîst leşgeren bisal ditin. Bi poren xwe yen direj î hûnayî  
û kûmen segoşeyî bûn. Di reze de rawesti bûn. Femandare  
wan î pîr î bejndirej î liserxwe, li peşberî wan sekinî bû.

Kolozek li sere vvî bû û şevkirasekî bej î hevrişîmî li navpiye  
wî bû. Dema çav li me ket, ber bi me hat, çend peyven dosta-  
ne ji min re got û dûre dîsa vegeriya ser kare xwe. Me kir ku  
em rawestin û li amojgariye binerin, le ji me daxwaz kir ku  
em Vasflîsa Yegorovnaye nedin payîn. Ê soz da me ku ew e jî  
li pey me were. Dûre jî li gotinen xwe zede kir û got:

- Hejayîyek ku hûn li vir bisekinin û le binerin, tune ye.

Vasflîsa Yegorovna bi rûkenî û mervayî pergî me hat.

Mîna ku em ji bere de hevdu binasin, bi me re ket tevgere.

Leşgere bisal û Palaska destirman texte nen dadihanîn.

Jina kapîtan got:

- Ev Ivan Kûzmîça cima îro amojgariye ewqas direj dike?

Palaska, biçe bani kapîtan bike, bila were taşte bixwe. Ê ka Maşka(\*) li kudere ye?

Di ve gave de keçek hîjdehsale ket hundur. Ruye we gilover, gupen we sor, pore xwe i zerokî di paş de şekiri bû û haveti bû paş guhen xwe yen şermok û sorikî. Di ve diyîna cara peşîn de, xwîna ve keçike tew bi min serîn ne hati bû. Ji ber ku Şvabrîn ji min re goti bû keça kapîtan rengdînek e. Keçika bedew li quncikekî rûnişt û dest bi dirûna tiştekir kir. Di ve navbere de şorbe hanîn. Dema Vasflîsa Yegorovnaye dît ku (\*) Maska, Maşa: Ji şerinkirina navS Maryaye ti.

36

mere we hej ne hatiye, cara duduyan Palaska şand pey.

- Ji kapîtan re bibeje, mevan dipen, şorbe sar dibe. Amojgarî ji dest te nareve, hej wexta wî pir e, dûre heta ku bixwaze dikare gewriye ü xwe hişk bike.

Gelek ne buhurî kapîtan û pîremer î yekçav bi hev re hatin.

Jina wî pirsî û got:

- Ev çi ye, bawkim? Evji kengî de ye ku xwarin hatiye rastkirin, û tu hej ne li vir î.

îvan Kûzmîç bersiv da û got:

- Tu dizanî ku ez li ser kare xwe me, Vasflîsa Yegorovna.

Min amojgarî dida leşgerSn xwe.

Jina wî bi hers:

- De bes e gidi! Amojgariye dide! Ne ew tişteki tedigehîjin  
û ne jî tu ew kes î ku tişteki bi meriv bidî hînkirin. Ku tu li  
mala xwe rûništa û banî Xwede bikira, ew e baştir bibûya.  
Mevanen heja, kerem bikin tiye xwe bigiren.

, Em U ber texte nen rûniştin. Deve Vasflîsa Yegorovnaye  
ne diket hev û pirs li ser pirse ji min dikir. De û bave min dijya  
an ne, li kudere ne, revvşa wan çawa ye? Piştî bihîst ku sesed  
xulamen bave min hene;

- Ne hindik in! got. Ca bifikirin, bi rastî jî dewlemend  
bene. Le em, me Palaşkayek tene heye. Le sikir ji Xwede re  
em dijîn û diçe. Hustuxwariya me, tene Maşa ye. Keçik edî  
berzewac e, le ka ji bo male çiyê we heye? Seyeki şimşîrîn, şalikek  
û se kapiken ji bo serşoke! Qet neba xortekî şîrpak le  
xwedî derketa, an ne ew e di mal de bimîne û jiyana we be  
mer bibuhure.

Min bala xwe da Marya Ivanovnaye, ruye we sipûsar bû bû  
û çend dilop hesir jî gerî namkiya we bûn. Ji nişka ve dile min  
bi keçike şewutî, û min lez kir ku ez mijara axaftine biguherim.  
Be wext û be cî min got:

- Dibejin, başkird xwe amade dikin ku bavejin ser kela we,  
ere?

Îvan Kûzmîç pirsî û:

- Kî viya dibeje, ezbenî? got.

Min göte wî:

37

- Li Orenbûrge dihat gotin.

Fermander:

- Ji ber xwe davejin, got û dîtinen xwe da xuyakirin. Ev ji

kenge de ye ku li vir edî ne deng û ne gotinek e. Başkird newerin xwe bilivînin û kirgizan jî dirve meran ditin. Ez ne bawer im ku carek din pel van derina bikin. Ku car din lingen wan bi van derina bikeve, ez e wusa li wan bikim ku heta deh salan hiş neyete sere wan.

Ez zivirîm ser jina kapîtan û min je re got:

- Le hûn? Ma hûn natirsin ku di kelayek weha bi xeter de bijîn?

We bersiv da û got:

- Meriv hîn dibe, ezbenî. Bîst sal berîya naha, dema ku em nû ji alayiye hati bûn vir, ew Xwede tene dizane be ez çiqasî ji van kafiren çavrijiya ditirsiyam. Wexta ku min çav li kolozen wan yen bilind dixist, an jî qerîha wan dihat min, bawer bike ezbenî, ji tirsan ev dile min dihat ber deve min. Le ez wusa hîn bûme ku naha vverin û bibejin neyar hatine, dor U keke girtine û hîrehîra wan e, ez e tew ji tiye xwe jî nelivim.

Şvabrîn, bi giranî:

- Vasflîsa Yegorovna jineke gelekî werek e, got. îvan Kûzmîç baştir dizane.

îvan Kûzmîç

- Bele wusa ye, got. Ew ne ji wan jinen tirsonek e.

Min pirsî û got:

- Le Marya îvanovna, ew jî nola we werek e?

Vasflîsa Yegorovnaye:

- Maşa? got. Na, Maşa tirsonekek reben e. Hej hînî denge tifinge ne bûye. Ku dengekî bibîhise, dest û ling le dilerize. Du sal beriya naha, ez jî nizanim be ji kudere hati bû hişe wî, îvan Kûzmîç di roja bûyina min de topa me teqandi bû, û ji

tirsa pir ne ne ma bû ku keçike dine li xwe biguheranda. Ji we roje û vir de, em jî bi we topa çavrijiya teqe nakin edî.

Em ji ser xwarine rabûn. Kapîtan û jina xwe derbasî oda xwe ya raketine bûn, ez û Şvabrîn derketin derve û me ew evara xwe bi hev re buhurand.

38

-IVDUELLO

Baş e, xwe bipareze we çaxe

Ca ez e çawa te bidim bersingan!

«Knyajîn»

Di ve navbere de çend hefte buhurîn. Ez hînî kela Belogorske bû bûm edî, û tew kefa min jî ji ve jiyane re hati bû. Li mala femandaran, U hemberî min bi tevgerek wusa bûn ku fena mervatiyek min ya nezîk bi wan re hebe. îvan Kûzmîç û jina xwe, herdu jî meriven gelek heja bûn. îvan Kûzmîç ji leşgeriyek be pîrpirik bilindi efserîye bû bû. Be amojgarî û kavik bû. Le merivekî pir baş û dilpak bû. Hefsare wî di dest jina wî de bû û ev ji li gor xwiye wî î bexem bû. Vasflîsa Yegorovnaye karûbaren leşgeriye jî wek ye mala xwe didît û çawa ku dare mala xwe digerland wusa jî dagera keke dimeşand.

Marya îvanovnaye, U ba min edî xeribî ne fikir. Em li hev xwîngermî bû bûn. Ez tegebiştîm ku ew keçeke baqil û diltenik e. Min jî qet ne dît ku çawa xwîna min h ve malbata baş û li sutvane garnîzone îvan îgnatyîçe yekçav germ bû bû. Ew î ku li gor Şvabrîn, pewendiye ne xweş di navbera wî û Vasflîsa Yegorovnaye de hebûn. Ev rasterast çilkek bû û tu rastiyeke ve pewendiye tunebû. Le dema ku Şvabrîn ev digot, qet nerihet ne dibû.

Biryara fermana efseriya min hati bû. Ji hela kar de piştku-  
39

liyek min tunebû. Li ve kela rastaXwede ne meşek û ne amojgarî  
dibû. Tew nîgehbanî jî ne dihat girtin. Cara ku dile femandar  
bixwesta, H gor sere xwe amojgarî dida leşgeran.

Lewra di her vegera reze de, ji bo ku çep û raste xwe tevlihev  
nekin, hemî leşgeran banî Xwede dikirin; le dîsa jî tu yekî nizani  
bû. Çend pirtûken bi fransî li ba Şvabrîn hebûn. Min  
dest bi xwendina wan kir û li hemberî edebiyate daxwazek li  
min rabû. Min sibehen xwe bi xwendin û wergere dibuhurand.  
Û carina jî xerîk bûm ku bi xwe helbestan binivîsim.

Min xwarina xwe hertim U mala femandar dixwar û ji roje  
wexte xwe yen din jî, dîsa min pirî caran li wir dibuhurand.  
Evaran carina Gerasîm î metran, bi Akûlîna xwe ya awan re  
dihate wir. Bi awaniya xwe, we di wî navçeyî de nav û deng  
dabû. Ji xwe min û Şvabrîn heroj hevdu didît. Le her ku diçû  
ji bo min şorgermiya wî hedî hedî sar dibû. Tinazen ku bi  
malbata femandar fikir, nemaze ew peyven ku ji bo Marya  
îvanovnaye dikirin, tew bi min xweş ne dihat. Bele, di kele de  
tu civatek din tunebû ku ez teketama nav wan, le ji xwe min jî  
daxwaza tişteki wusa ne dikir.

Ew gotinen di ware serhildana başkirdan de, rast derneketin.  
Rewşa derûdora kela me, be teqereqî dixuya. Le ev aşitiya  
bedeng ji nişka ve bi pevçûnek duhelî hat şikandin.

Min bere goti bû ku ez hinekî xerfîd edebiyate dibûm. Li  
gor we deme essayen(\*) min yen ku hebûn, ewqas ne xirab  
bûn. Piştî çend salan Aleksandr Petroviç Sûmarokov(\*\*) ji  
bo wan gelek pesne min dida. Ji wan helbesten ku min nivîsî



bûn, ji yeke piçûk ez gelek kefxweş bûm. Ev rastiyeke e ku ni-  
viskar carina fena bi yekê bişewere, xwe dide xuyakirin; le me-  
(\* ) Essay: Di edebiyate de babetekê nivîsiye. Bi tirkî:Deneme  
(\* \*) Aleksandr Petroviç Sûmarokov (1718-1777) niviskarekê.  
ûris e. Di destpiki de xevroşik, helbest û sitranin geliri nivîsî.  
Neh trajediyin wîhenin. Hamlet dapejinand zimani ûrisî û dawiya  
wi bi bextiyari qedand. Behna klasîkin fransî ji pikenînin  
we ti. Di nava ûrisan denivîskare pişîn e ku nani xwe bi  
seri qelema xwe bi dest xistiye.

40

best peydakirina xwendevanekê ye ku pesne wê bide. Piştî ku  
min jê helbesta xwe ya piçûk nivîsî û qedand, min bir ji Şva-  
brîn re. Di kele de ye herî baş ê ku ji helbeste difahmî, ew bû.  
Piştî çend gotinen kurt, min deftera xwe ji berfîca xwe derxist  
û min bi deng se carîn je re xwend:

Bavejim ji serixwe hiş û aqili evîndari

Min divit ji bîr bikim wi dilberî

Ma qet difilite meriv

Bi reva ji Maşayi

Ew çavin ku ez giridame

Şev û roj lipiş min in

Herji bo wan dipeke dil

Ûxwe bixwe dihelim ez

Binireji bo evîna te şevmtim

Çi dibe Maşa, ji bîr neke min

Her dem di bîra min de i tu

Bavver bike xweşika min...

-Te çawa dît? Min ji Şvabrîn pirsî û ez beşik li bende wê

bûm ku pesne min bide. Le mixabin, Şvabrîn ve çare weke hertim ne ewqas merva bû. Bi liveke ewle, rasterast got ev helbesta xirab e.

Min xwest beyi ku ez hersbûna xwe bidim xuyakirin, min pirsî:

- Cima xirab e?

- Ji ber ku, got, ev helbesten weha bes kare mamoste min î Vasflî Kîrflîç Trdeyakovskî(\*) ye. Nizanim le, ev ya te jî pir û pir helbeste wî yen evîne tîne bîra min.

Ev got û defter ji dest min girt, dest pe kir bi awaye ku tinazen xwe yen herî giran bi min bike, U ser her carîn û bejeyî (\*) Vasîlî Kîrilîç Trdeyakovskî (1703-1769) niviskarekî ûris î bi nav û deng e, li ev nav û dengaji bikiriya wî hatiye.

41

sekini û hûr hûr vekola. Min zede xwe ne girt û deftera xwe ji dest wî kişand û min got, ez e edî li darî dine helbesten xwe peşane te nekim. Şvabrîn ev gefa min jî di ser guhe xwe re havetû:

- Ca em e binerin, got, ka tu e bikarî li ser soza xwe bimînî, an ne. Çawa ku îvan Kûzmîç berîşîve pîyalek votka dive, herwusa helbestvanek jî guhdar dive. Baş e, ca bibeje, ev Maşa kî ye ku evîndariya te ya wusa jidil, bi lev dike? Ma nebe ku ev Marya îvanovna me be?

Min bi mirûztirşî bersiv da û göte:

- Bi te ne ketiye. Min ne ramanen te û ne jî şiroven te dive.

Her ku diçû Şvabrîn betir ez tetirxanî dikirim.

- Errr! Çi helbestvanekî bexfl û evîndarekî nefspiçûk e! Le ve şîreta hevale xwe ji bîr neke. Ku te serketin dive, heviye ji helbestan nepe.

- Ez tenagehijim be tu dixwazî çî bibejî, Mîrza efendî. Tu dikarî jî kerema xwe re vebikî, gelo?

- Serçavan. Ez dixwazim bibejim ku te dive Marya îvanov-  
na di destpeka tariya şeve de were ba te, bi çend helbesten  
xwe yen dilpekîn ne, dive tu cotek guhar yadîgare we bikî.  
Xwîn dawerivî çaven min. Bi dijwarî min xwe girt û got:

- Tu cima li ser we weha difikirî?

Bi pişirmek kiret got:

- Ji ber ku ez jiyame, ez bi xwiye we dizanim loma.

Bi hersek mezin ez di ser wî de qeriyam û min got:

- Tu derevvan dikî, bepaye! Tu beşerm derewan dikî!

Gwîne Şvabrin guherî, hişkfirî bi piye min girt û:

- Tu e ji ve yeka xwe poşmam bî, got. Ez, te banî duelloye  
dikim.

Min bi kefxweşî je re got:

- Serçavan, te kengî dive, fermo!

Di we gave de min dixwest ez xwîna wî vexwim. Min tavile  
bere xwe da ba îvan îgnatyîç. Min nehirî ku bi fermana jina  
kapîtan derziyek girtiye deste xwe, kuvarkan bi benekî ve  
dike ku ji bo zivistane hişk bike.

Çer ku çav li min ket:

42

- Wey, Pyotr Andreyiç! got. Hûn bi xer hatin! Hûn û van  
derina! De ka kerem kin, ez dikarin ji we re çî xizmete bikim?  
Bi kurtebirî min je re kat kir ku min û Aleksey îvanîç  
Şvabrîn pevçînîye. Ê min je xwest ku were bibe dîdevane  
min. îvan îgnatyîç ew yeka çave xwe zîq vekiri bû li min dine-  
ri, û bi bal guhdariya min dikir.

Piştî ku min gotinen xwe qedand.

- Ango, daxwaza we ew e ku hûn e Aleksey îvanîç bikujin û hûn dixwazin ez jî bibim dîdevane ve yeke, ere? We ev dive, ne?

- Bele, wek ku hûn dibejin, min got.

- Ji Xwede bitirsin, Pyotr Andreyîç! We ev ji kudere derxist! We û Aleksey îvanîç pevçiniye, ma çi dibe? Ma çer ne benîşt e ku bi we ve bizeliqe. Ku wî ji we re daye çeran, hûn jî çeran li wî bikin. Kurmikek direjî we kir, hûn ji du kurmikan bavejin bine guhen wî. Yek ji we yek ji wî ew e derbas be, biçe. Û hûn e dîsa li hev werin. Ka ez bipirsim, kuştina yekî ji refe xwe çi ye? Ku we ew Aleksey îvanîça bikuştî baş dibû, ji xwe tew xwîna min jî U wî nakele. Le ca bifîkirin, ku ew we bide ber singan? Hi? Ka ez bipirsim, we çaxe çi dibe? Sutvane dilpak bi van şevviren xwe nikari bû min ji ser fý-kra min ve gerîhe. Di daxwaza xwe de min ling da ber xwe. îvan îgnatyîç:

- Hûn dizanin, got. Hûn bi ya xwe bikin. Ma çi hewce ye ku ez bibim dîdevan? Di pevçûna merivan de çi heye ku meriv le temaşe bike? Ka ez bipirsim, ma ne bemane ye? Sikir ji Xwede re, welle min bi tirk û swedîyan re jî şer kiriye û gelek tiştên din jî hatine sere min. Le..

Min kir ku ez berpirsiyariyen dîdevanekî duelloye je re kat bikim, le îvan îgnatyîç tew tenedigeMşt.

- Hûn dizanin, got. Ku pewîst be ez jî xwe tekflî vî karî bikim, we çaxe ez e biçim berpirsiyariya xwe bînim cî. Biçim ji îvan Kûzmîç re bibejim ku ew e merkujiyek di kele de bibe û ji bo nave kele jî ne baş e. De qey ku bive, ew e reyekî ji çareseriya

vî tiştî re bibîne.

Ez venciqîm, min xwe havet bexte wî û ez li ber wî geriyam

43

ku nece ji ferman dar re nebeje. Piştî gelek dijwariyan, min soz je girt ku nece ferman dar pe nehesîne. û min jî edî dev ji wîberda.

Wek hertim ez evare dîsa li mala ferman dar bûm. Ji bo şikek çenebe an pirsên ne xweş ji min neyete kirin, min xwe duguvuşand ku ez xwe rihet û kefxweş bidim xuyakirin. Le ez çî derewan bikim, ew xwrnsariya ku herkesen di ve revvşa min de dikare di xwe de bibinin û pe pesne xwe bidin, min di xwe de ne didît. Ve evare pejnên girî U qirika min dipiçikîn. û Marya îvanovna heta îro tu carî weke naha bi min xwînşerîn ne dixuya. Ez difikirim û min digot; dibe ku ev cara dawîn e, ez we dibinim û henveha bala çaven min dikişand. Di ve navbere de Şvabrîn hat. Ez çûm ba wî, min ew xewle kir. Ew peyvîna min ya bi îvan îgnatyîç re, min ji wî re got.

Wî bi livek xwînsar:

- Me çî ji dîdevanan e? got. Be dîdevan jî em e kare xwe biqedînin.

Ji bo duelloye me li hev kir ku em sibe saet li heftan, li paş dizen jera keke hevdu bibinin. Reng bû ku ev axaftina me, bi dostanî bû bû û loma ruye îvan îgnatyîç kenîya, ya dile xwe vekir û bi kefxweşî got:

- A, wusa. Aşitiyek bedî, baştir e ji şerekî jidil. Kerba me-riv, li sere meriv dide der.

Vasîlsaya ku li quncikekî rûnişti bû û fala qeremaçan vedikir:

- We got çî, îvan îgnatyîç? Deng ne hat min.

Îvan Îgnatyîçe ku dit mirûze min tirş bû, soza ku dabû ket bîra wî, di cî de sar bû û edî nizani bû ku ew e çi bersive bide.

Di ve navbere de Şivabrîn xwe gihand hewara wî û got.

- Îvan Îgnatyîçe lihevhatina me pîroz dike.

- Ka te bi ke re şer kiriye, canekem?

- Bi Pyotr Andreyîç re. Em li ser tiştêkî rabûn hev.

- Li ser çi tiştî?

- Qet, vala. Ji bo helbestekî, Vasflîsa Yegorovna.

- De we jî tiştêkî pevçûne dîtiye, ha! Ji bo helbestekî!.. Baş e, le dûre çi bû?

44

- Pyotr Andreyîç ji xwe re helbestek nivîsî bû û îro hat ji min re xwend. Sitranek ku bi min xweş bû, min jî rabû bi we bersiv da:

Keça kapîtan, keça kapîtan

Dernekeve der şeve nîvi şevanl...

Di navbera me de betamý derket. Pyotr Andreyîç bere ji min hers bû. Le piştî tegehîşt ku kî bixwaze dikare ji xwe re bisrire, ev tişta jîji navbere rabû.

Li hember ve rûreşiya Şvabrîn hindik ma bû min hersa xwe bida der. Le ji bilî min tu kesî ji van devhabetinen wî fahm ne kir û henveha jî kesek li ser wan ne sekinî. Peyivîn, ji ser helbestan zivirî ser helbesrvanan. Fermandar dîtinen xwe yen li ser wan vekir û got; ev hemû kesina meyxwoş û xerifî ne. Bi dilpakî şîretek H min kir ku ez dev ji nivîsîna helbestan berdim, levvra li gor wî, nivîsîna helbestan li peş vatiniya leşgerî asteng û tiştêkî vikûvala bû.

Liwirbûyîna Şvabrîn hers H min har dikir. Gelek ne buhurî,

min xatir ji ferman dar û malbate xwest, hatim mal, min bala xwe da poze sûre xwe, min ferman da Savelyîç ku sibe saet h hefta min şiyar bike û ez çûm ketim nav lihefe.

Sibetire U we saeta biryara me û li paş dizen giye, ez li pawûka hatina neyare xwe sekini bûm. Piştî demeke kurt xuyanî bû, hat û got.

- Dibe ku xelk me bibinin. Divê em lez bikin.

Min üniforman xwe ji xwe denristin û bi bertena kires me sûre xwe kişandin. Di we gave de, îvan îgnatyîç ji paş dîzeke derket raste û penc leşger li pey wî. Ji me re got; ferman dar şandiye pey we û dive em biçin. Ji begavî me deng ne kir û leşgeran dor li me girtin. Bi gaven leşgerî me bere xwe da kele û em li pey îvan îgnatyîç meşyan.

Em ketin hundure mala ferman dar. îvan îgnatyîç deri ve- kir û bi livek quretî got.

- Min hanin!

Vasflîsa Yegorovna bergitî me hat:

- Ax, ev çi ye, mîrzayen min! Ma ev e jî bibaya? Li kela me,  
45

meriv bi cane hev dikevin! îvan Kûzmiç, van tavile baveje zmdane!  
Pyotr Andreyîç! Aleksey îvaniç! Ka wan sûren xwe bidin!  
Bidin, bidin... A, wusa.. Palaska, ca van şûran bibe dayne serdabe! Min ev ji te ne dipa, Pyotr Andreyîç! Ma tu qet şerm nakî? Ji Aleksey îvaniç re ez tişteki nabejim. Ji xwe ew ji ber kuştina merivekî ji alayîye dunristine. Baweriya wî bi Xwede tüne. Le tu? Ka çi bi te hatiye, tu jî bi berbaya wî dikevî?  
îvan Kûzmîç bi hejandina sere xwe gotinen jina xwe rast dipeyitand û di nav re digot:

- Ka we bihîst? Vasflîsa Yegorovna rast dibeje. Di rebazen ordiye de düello hatiye qedexekirin.

Di ve navbere de Palaşkaye sûre me ji me girt û bir xiste serdabe. Be daxwaza min, pişirîneke bi min girt. Şvabrîn her bi revvşek candillî bû. û bi livek hişkesar ji jina fermanदार re got:

- Giranbuhayiya we U ser ser û çave min, le ez dibejim dive heqe we tunebe ku hûn dadpîrsiye U me bikin. Bihelin bila îvan Kûzmiç le binerin. Ev kare wî ye.

- Xwedeyo, a U min û a li vîya! Ma jin û mer tev ne can û rihek e? îvan Kûzmîç! Tu çi bawîşkan dikeşî. Zû her yekî van baveje paş deriyekî nanrijî ku bila hişe wan bete sere wan. Ji Gerasîm i metran re bibeje, bila ewjî tavvanekî bide van. Bila ji Xwede lava bikin û xwe biborînin, û bila U hember merivan poşmaniya xwe bidin xuyakirin.

îvan Kûzmîç. nizani bû be çawa biryara xwe bida, û gvîne Marya îvanovnaye zer bû bû. Tevildûmane xwe ragirt, hersa jina fermanदार daket û em bi hev dan maçkirin. Palaşkaye sûre me dîsa hani. Mîna ku em li hev hati bin, em ji mala fermanदार derketin. îvan îgnatyîç jî bi me re bû. Bi livek hişk min je re got:

- Qaşo we soz da bû min ku we e ji fermanदार re tişte negota, ma qet we şerm ne kir?

Sutvan jî bersiv da û got:

- Ez bi nave Xwede sond dixwim ku min qet tişte ji îvan Kûzmîç re ne gotiye. Vasflîsa Yegorovnaye hertişt ji deve min

46

girt û beyî ku haya fermanदार je hebe, we peşî li vî tiştta girt...



Le sikir ji Xwede re ku bûyer weha çû serî.

Bi van gotinen xwe re bere xwe da mala xwe û çû. Ez û Şvabrîn bi tene man.

Minjeregot:

- Ev doza me e bi vî awayî neqede.

- Le qey ew e wusa neqede, got. Dive hûn heqe ve beşermiya xwe bi xwîna xwe bidin. Le ez bawer im heta demeke jî ew e çavneriye li me bikin. Heta çend rojan dive em xwe lihevhatî bidin xuyakirin. Di xweşiye de bimînin!

Û mîna kü tew tiştê ne bûbe, em ji hev qetiyên.

Ez vegeyam mala fermanîdar û weke hertim ez U keleka Marya îvanovnaye rûniştim. îvan Kûzmîç ne li male bû. Vasîlîsa Yegorovna bi karûbaren male de keti bû. Bi dengê nizm em bi hev re peyvîn. Marya îvanovnaye bi zimanekî xweş rexne U min digirt û nerihetiyên xwe yê li ser pevçûna min û Şvabrîn kat dikir û digot:

- Dema ku min bihîst, hûn e bi şûran pevçîn, ez di cî de sipûsar bûm. Ev mer çiqas seyr in! Ji bo peyveke -peyvek ku piştî heftekî ew e ji sedî sed were jibîrkirin- hûn amade ne ku bi hev bikevin û ne tene jiyana xwe, henveha bextiyariyên hinekên din jîbikujin... Le ez ne ewle me ku we pevçûn dendsti be. Beşik Aleksey îvanîç tawanbare vî tiştî ye.

- Hûn çawa dikevinbawerîyek wusa, Marya îvanovna?

- Nizanim... Ewqas tinazker e ku! Kefa min ji Aleksey îvanîç re naye. Xwîna min qet li wî ne keliya. Le tiştê seyr e, min qet ne dixwest ku ew ji min xwî bike. Ez ji vîya gelekî eşiyam.

- Baş e, le hûn çî difikirin, Marya îvanovna? Ew ji we hez

dike, an ne?

Rû li Marya îvanovnaye sor bû, zimane we li hev geriya:

- Ez bawer im... Wusa xuyaye ji min hez dike, got
- Çawa wusa xuyaye?
- Ji ber ku peşniyara zewace li min kir.
- Peşniyara zewace kir, ere! Baş e kengî?
- Sala çûyî, bi du mehan beriya hatina we.

47

- Ê we jî ne pejirand?

- Wek ku hûn dizanin, Aleksey îvanîç merivekî baqil, ji malbateke baş û dewlemend e. Ji ve sika min nîne. Le dema difikirim ku ez e di dere de li peş çaven herkesi wî maç bikim... Na, ez nakim! Dine qul bikin û di hustiye min de bikin jî, na!

Ev peyven Marya îvanovnaye çav li min vekiri bûn û gelek tişt di sere min de zelal kiri bûn. Ez tegehiştim ku Şvabrîn ji bo çî bi zimanekî wusa kiret qala we dikir. Xuya bû ew bi ve dilxweşiya nezîkiya min û we hesiya bû û dixwest me ji hevdu bike. Piştî ez tegehiştim ew peyven ku wî goti bûn, ji bilî heneken bepîvan û berûmet, havetina çilkan e; we çaxe ew peyven wî yen bû bûn sedema heftûheştta me, U ber çave min reştir bûn. Daxwaza arihandina vî fesadî li min zedetir bû. Ê ez betewatî li bende fesaleke baş bûm.

Ji bo vî karî min zede ne pa. Sibetire ji bo nivisîna helbestek evîne, sere qelema min di nav diranen min de, ez rûnişti bûm. Şvabrîn li pencera min da. Min qelem ji dest xwe danî, sûre xwe gireda û ez derketim.

Şvabrîn ji min re:

- Ma çî hewce ye ku em kare xwe bi dûr bixînin? got. Edî kesek çavneriye U me nake. Ku em biçin keleka çem, tu keseke U wir astengiye H me neke.

Em bedeng bi hev re çûn. Di xaçere de me xwe berda keleka çem û em li wir sekinin. Me sûre xwe kişand. Şvabrîn ji min destsiviktir bû. Le ez bi heztir û betirstir bûm. Monsieur Beaupre ku di demeke de leşgerî kiri bû, binek hîmen lezgîniya şer hînî min jî kiri bû. Xweş xuya bû, Şvabrîn qet qayişkeşekî wusa xeterbar ne dipa ku derkeve hembere wî. Heta demek direj me hevdu birîndar ne kir. Di dawiyê re min te derxist ku Şvabrîn westiyaye û bi heztir min herişî wî kir û heta ber qeraxe çem min da ser piştê wî. Ji nişka ve min bihîst ku nave min bi dengê bilind hil te. Ez zivirîm û min niherî Savelyîç di xaçere de berjer ber bi me dibeze... Di we gave de şûrekî bipet li jera piye min î raste, li ser sînge min ket. Ez ketim û bi bîr ve çûm.

48

-VEVÎN

Ax,tu keçika ciwan û spehî  
Nebe nebe tu mir bikî  
Bipirseji di û bavixwe  
Bişewire bi dost û nasexwe  
Bila hişî te li seri te  
Bûkaniya te lipiştê te be  
«Sitrana Gelerî»  
Ku te dîtyekîji min çitir, ji bîr bike min  
Ku te dîtyekîji min xirabtir, bi bîr bîne min  
«Sitrana Gelerî»

Dema ku ez bi xwe hesiyam, heta demeke direj jî hiş ne hat sere min û min nizani bû çî bi sere min hati bû.

Ez di odekek xerîb de, li ser lihefe direjkirî bûm û min xwe gelekî behele hîs dikir. Findek di dest Savelyîç de bû û li peşberî min rawestiya bû. Paçbirîna li pî û singe min peçayî, yekî hedîka vedikir. Sere min jî hedî hedî zelal bû, min düello bi bîr hani û tegehiştîm ku ez birîndar im. Di we gave de derî kir çirînî. Pistepistek wusa hat guhe min ku pe re ricifiyeke ez girtim.

- Çawa bû?

Savelyîç keser veda û got:

- Her wek bere ye. Ev penc şev û penc rojen wî ye, hej ne hatiye ser xwe.

Min dixwest ku ez xwe bizivînim, le min nikari bû. Bi dijwarî tene min got:

49

- Ez li kudere me? Ew kî ye li wir?

Marya îvanovna nezflri lihefe hat, xwe di ser min de xwar kir:

- Hûn çawa nin, xwe çawa hîs dikin hûn?

Bi dengekî behele min got:

- Sipas, baştir im. Hûn in, Marya îvanovna? Ji min re bibejin...

Ez zedetir nikari bûm bipeyivîyam û min deng ne kir.

Kefxweşiyek li ruye Savelyîç belav bû, ji dilşadî qerînek pe ket û got.

- Hat ser xwe! Hat ser xwe! Sikir ji te re Xwede! Ero, Pyotr Andreyîç! Te zirav li min qetand, çave min! Ma bi gotine ye! Penc roj...

Marya îvanovnaye peyva wî birî û got:

- Bi wî re zede nepeyive, Savelyîç. Hej behele ye.

Derket der û li pey xwe, derî hedflca girt. Sere min wek defeke dizingiya. Henveha ez U mala femandar bûm. Marya îvanovna dihat serledana min. Min xwest ku ez çend pirsan ji Savelyîç bikim, le wî sere xwe hejand û bi tiliyen xwe guhen xwe xetimand. Ji qehran min çaven xwe dan hev û tavile ketim xeweke giran.

Dema ez şiyar bûm, min banî Savelyîç kir le ji dela wî ve çaven min bi Marya îvanovnaye ket ku li keleka lihefa min rawestiyaye.

Bi dengekî perîyan silav h min hilda. Ew kela dile xwe î we gave, ez nikarim bi lev bikim. Min bi deste we girt, ruye xwe di ser de xwar kir û bi hesren dilkelîn şil kir. Maryaya deste xwe bi şûnde ne kişand... û ji nişka ve leven we bi gupa min bû û min ramîsana we ya germ û nerm hîs kir. Her deveme min bû wek agir.

- Marya îvanovnaya xweşik û serîn, min got. Ji min re bibe jin û min bextiyar bike!

Bi varqilîn deste xwe kişand û got:

- Ji bo Xwede, behna xwe fere bikin. Hûn hej ji xeteriye ne filitîne. Birîna we e bibuşkuve. Ne ji bo kesekî be jî, bi kemanî ji bo min xwe hemet bikin !

Bi van gotinan re derket der. Ji kefxweşî ez bû bûm wek

50

serxweşekî. Mîna ku bextiyariye ez vegerandi bim ser jîyane.

Ew e bibe ya min! Ew ji min hez dike! Tevayiye hebûna min bi ve ramane dagirtî bû.

Ji ve û pe ve, her ku diçû ez baştir dibûm. Ji ber ku di kele de tu hekîmek tunebû, berbere alayiye ez derman dikirim. Ji xera Xwede re, ew ne ji wan berberen zimandirej bû. Xwî û xortaniya min, zûtir ez ber bi başiye dibirim. Tevayiye malbata ferman dar keti bûn reze ku li rihetiya min binerin. Marya îvanovna şev û roj ji paş sere min ne diqetiya û ez bi tene ne diniştim. Di fesala peşin de, min dîsa dest bi katkirina evîna xwe ya nîvçemayî kir. Ve çare, Marya îvanovnaye bi behnek fere heta dawiyê guhdariyan min kir. Beyî ku xwe li naz bixîne, we jî ya dile xwe rasterast ji min re kat kir û got; min tu şik nîne ku de û bave min e jî ji bextiyariya min kefxweş bin.

- Le baş bifikire, got û le zede kir. Aya ji hela de û bave we de ew e tu astengiyek dernekeve?

Ez ketim ramanan. Ji dilovaniya diya xwe, min tu şik tunebû. Le ji ber ku min bi xwî û dîtinen bave xwe dizani bû, min digot qeye ew e zede li ser evîna dile min nesekine û dûre bibije; ev sersewsiya xortekî ye. Di vî warî de ez bi Marya îvanovnaye re vekirî peyivîm. Le ji hela din ve jî heta ku ji deste min hat, min nameyek dilgermîn je re nivisî û min je dilxweziya baviye xwest.

Min name peşanî Marya îvanovnaye kir. We ev name ewqas rast û ewqas dilşewat dît ku, edî tu şik pe re nema ku em bersiva serketine bigiren. Bi hemî pejnen xwe yen jidiliya evin û xortaniye, xwe siparti bû min. Piştî başbûyina min, di rojen peşin de ez bi Şvabrîn ve li hev hatim. Dema îvan Kûzmîç ji bo duelloye li min xeyidî, weha got:

- Ero, Pyotr Andreyîç! Bi rastî jî diviya bû, min tu bihaveta zîndane, le te ya xwe dît edî... Tişte ku bi sere Aleksey îvanîç

de hat ev bû. Min ew di kelboxa tenûre de da sekinandin. Û sûre wî jî, Vasflîsa Yegorovnaye dest da ser. Bila hinekî bi tene bimîne û bifikire ku ji kirina xwe poşmam bibe.

Ji ber bextiyariya min, ew bebextiyen ku ew e li min çebibûya, hemî belav bûn. Min ji wan lava kir ku Şvabrîn azad bi-  
51

kin. Femandare dilovan, piştî ku destura jina xwe jî girt, biryar da ku Şvabrûy ji zindane derxîne.

Şvabrîn hat ba min û da xuyakirin ku ji wî tişte di navbera min û wî de bû bû, gelek û gelek xemgîn e. Bi deve xwe hemî kemasî li xwe danî û ji min lava kir ku ez hertiştî ji bîr bikim. Rikebarbûyin ne xwiye min e. Min bexşa pevçûna me jî û bexşa we birîna ku min ji deste wî girti bû jî, da. Min çilkhavetina wî da xatire şerefek şikiyayî û evînek bi şûnde vegeyriyayî. Min neyare xwe i bebext ji dil bexişand. Piştî demeke ez bi tevayî baş bûm û derbasî mala xwe bûm. Ez be tewatî U bende bersiva nama xwe bûm. Min zede hevî tunebû û min dixwest ez wan xirabiyen di dile xwe de vesînim. Min hej ji Vasflîsa Yegorovnaye û mere we re tişte ne goti bû. Le min dizani bû ku ev peşniyara min e bi wan xerîb neyet. Ne min û ne jî Marya îvanovnaye ev pejnen dile xwe ji wan vedişart. Lewra me ji bere de pe dizani bû ku ew e ji bextiyariya me re nebejin, na.

Bi rastî jî sibeke, namekek di dest Savelyîç de û ket hundir. Dema ku min dest havet name, hemî Yaşe min diricifî. Nivîsa navnişane bi destnivîsa bave min bû. Ez tavile tegehiştim ku ev ne tişteki vala ye. Lewra hertim diya min ji min re name dinivisî û bave min jî çend hevok di binî de le zede dikir. Di

vekirina we de, min gelekî xwe ragirt û car bi car her ew navnişana pîrozvver xwend:

«Ji lawe min Pyotr Andreyîç Grinyov re. Li kela Belogorska bajari Orenbûrgi»

Min fikir ku ez ji awaye destnivîse tebigehijim ku di name de çî hatiye nivisîn. Di dawiya davvîn de min biryara xwe da ku ez name vekim. Hej di hevoken peşîn de ez tegehiştim ku her tişt U ber baye çû.

Name weha hati bû nivisîn.

«Lawe min Pyotr! Ew nama te ya te ti de daye xuyakirin ku tu i bi Marya keça Mîronov re bizemycî û te ji me daxwaza destûre kiriye, di 15 vi mehe de ket desti me. Le tu viya baş bizani be ku ji vi tevgera te re, jixwe ez e bibijim, na. Ku ez bigihijim ba te û digel ku tu efserekî mestûmezin îjî, ez e mýsa li te bikim

52

ku hişî te bite seri te. Lewra te da myakirin ku ji boparastina welit tu hij ne hijayî m şûriye, û tu bi wî şûri bi tolazekî nola xwe ve ketiye duelloyi. Ez i tavili ji Andrey Karlovîç re nameyeki binivîsim û ji bixwazim bila teji Kela Belogorski rake cîyekî wusa dûr ku, li wir serhişkiya te nemine. Çer diya te bihîst ku tu ketiye duelloyi û tu birindar bûye, ji çehran nexweş ket û hîna jî di nava cilan de ye. Ev çî kare te ye? Digel ku ez newârim ji dilovaniya Xwedi hivî bikim, le dîsa jî ez ji lava di- kim ku te bide ser riyek rast.

Bavi te

AG.

Dema ku min ev nama xwend, ramanen cûda cûda di sere min de çûn û hatin. Ev girangotinen ku bave min xwe je ne



dabû paş, ez gelekî xawenşikestî kiri bûm. Di qalkirina Marya îvanovnayê de ew guhnedayîna wî ya ku bi min neheq dihat, ewqas jî bi min tevgerek ne li cî bû. Tew gava ez difikirîm ku ew e min ji kela Belogorske bişînin dereke din, xofeke digirt ser min. Le ji hertiştî betir ez li ber nexweşiya diya xwe diketim. Ez ji Savelyîç gelekî eşiyam, lewra min baş dizani bû ku wî de û bave min ji ve duelloye haydar kiriye. Di oda xwe ya teng û sar de ez çûm û hatim, li peş wî rawestiyam, bi awiren tûj min weha careke le nehirî û bi dengekî xirab min je re got:

- Ji ruye te de ez birindar bûm û meheke li ber mirine mam, le wusa xuyaye dile te hej rihet ne bûye û tu mirina diya min jî dixwazî.

Kelagirî li qirika Savelyîç piçikî û bi hîskik:

- Ji Xwede bitirsin, Pyotr Andreyîç! got. Ev çi ye hûn dibejin? Ji ruye min de hûn birîndar bûn, ere? Xwede jî pe di-zane be ji bo ku ez sînge xwe bidim ber sûre Aleksey îvanîç û we ji mirine bifihtinim, çawa bazdam! Le sere xwe bixwe, pirîtiye re ne da. Ê ka min çi bi diya we kiriye, Pyotr Andreyîç?

- Ma tu e hîn çi bikî? min göte. Ke ji te re got fesadiya min bike? An ji bo viya te bi dizî ferman ji hinekan girtiye? Savelyîç bi hesren çaven xwe;

- Min fesadiya te kiriye, ere? got. Tu mezin î Xwede! Ke-  
53

rem bikin û hûn bi xwe bixwînin be mîrza efendî ji min re çi nivisiye. We çaxe hûn e bibinin be çawa min fesadiya we kiriye.

Ê piştî van gotinen xwe nameyek ji berika xwe denrist. Min ev hevoken jerîn xwend

«Şerm bike, kûçikipîr! Min ewqas temiyin hişk li te kirin, li te hemî di ser guhi xwe re havitin û te ez ji tevgerin kuri min Pyotr Andreyîç haydar ne kirim. Heta ku xelkin xerib icbar man û wan ev nerindiyan wîbi min re gîhandin. Ma tu vatiniya xwe û temiyin efendiye xwe weha bi cî tini! Ji ber ku te rastî ji min veşart û tu bi berbaya naşîtiyaxortekîketi, ez i te kûçikipîr bikim şivani berazan. Ez fermane li te dikim! Çer ku te ev name xwend, divi tu tavile bi min bidî zanîn ku saxiya wî çawa ye. Dibijin ber bi başiyi çûye, rast e, an ne? Nemaze bi min bide zanîn ku ji kuderî xwe birindar e û dermankirina wî baş hat kirin, an ne.»

Rastgotina Savelyîç berçav bû, min xelet kiri bû ku ez je keti bûm şike û min tewş dile wî şikandi bû. Min je bexşa xwe xwest, le dile pîremer qet xweş ne dibû, her duçar dikir û digot:

- De qeye me e ev rojana jî bidîtana. Ev xelaten efendiyan me tene ji me kem bûn Ez kûçike pîr û şivane berazan... û birîndarbûyina

te jî ez bûm sedem, ere Pyotr Andreyîç! Na, xeletî ya min nine, ya wî mîsyoyî çavrijya ye. Lihevdayina singen hesin û havetina tîzikan, tu ji wî hewusî. Ji te kira bi vî avvayî tu e bikari bî xwe jî xirabe xelke biparezî! Ma çî hewce bû ku meriv ewqas pere birijanda û kar bida wî misyoyî!...

Le ke fesadiya min bi bave min de kiri bû gelo, ku ne Savelyîç ba? Aya general? Mîna ku dixuya ewqas bi min de ne diket. Ê îvan Kûzmîç jî pewîst ne dîti bû ku düelloya min ji jor re bibeje. Gelek tişt hatin hişe min, le li ser yekî jî min tu nikari bû biryarek bigirta. Di daraya dawîn de sika min li ser

Şvabrîn berhev dibû. Kirina fesadiya min e tene bi kerî wî bihata. Henveha dibû ku ez ji kele dûrketama û pewendiyen min û malbata kapîtan e ji hev bihata birin. Ez rabûm çûm ku her tiştî ji Marya îvanovnaye re kat bikim. Çer ku çav li min

54  
xist:

- Çi li we qewimî? got. Gvîne we çiqas vemiriye!

- Hertişt qediya! min göte û nama bave xwe da we.

Ve çare jî doba gwînvemiriye ya we bû. Pişti ku name xwend û qedand, bi destekî lertzok şûnde da min û bi dengekî nîvçe got.

- De qeye nivîsa li ser eniya min ev e... Malbata we naxwaze ez tekevim nav wan. Hertişt bi ya Xwede dibe! Xwede ji me baştir dizane be çi ji me re divet. Tişteki ji deste me naye, Pyotr Andreyîç. De qet nebe, hûn bextiyar bin.

Min bi qîrîn;

- Na ev nabe! got û min xwe havet deste we. Tu ji min hez diki û ez jî xwe didim ber hertiştî. Were em biçin xwe bavejin lingen de û bave te. Ew di hale xwe de ne, ne meriven dilpet û qure ne ew... Em destura wan bigrin û mara xwe bibirin. Ez ewle me ku ew e demek were, em e bikari bin bi bergerîn bave min jî nerm bikin. Diya min e piştgiriya me bike, ew dilovan e...

- Maryaye bersîv da û:

- Na, Pyotr Andreyîç, got. Be destura de û bave we, ez nikarim bi we re bizewucim. Ku ev be dile wan be, bextiyariya we e jî tunebe. Xwede çi kiriye, dive em pe qayil bin. Ku rojeke hûn ji xwe re dildareke din bibinin, ji yeke din hez bikin,

Xwede bi we re be Pyotr Andreyîç . Ez e ji bo we herduyan jî banî Xwede bikim.

Bi van gotinan re girî bi we girt û bi lez ji min dûrket. Min xwest ku ez li pey we tekevim ode, le min nehirî ku ez e nikari bim xwe bigirem û henveha ez vegeriyam mal.

Ez rûnişti bûm û keti bûm ramanen kwîr ku ji nişka ve Savelyîç hat û ez ji wan dûmstim. Kaxizek nivisandî direjî min kir û:

- Ca binere ezbenî, got. Ku min dive ez fesadiya efendiye xwe bikim û navbera kur û bave xirab bikim, fermo hûn bi xwe bixwînin û bibinin!

Min kaxiz girt. Wek bersiva nama bave min, Savelyîç ev nivîsi bû. Beje bi beje name weha bû:

55

« Mîrzaye min i mezin.

Bavi me îxerxwaz!

Ji kerema we, nama ku weji min re bi ri kir, kete desti min.

Hûn ti de bi kerem peyvan li ruyi min xulamixwe dixin û kimasiya min didin berpozi min ku min temiyin mîrza bi cî ne

haniye. Li ez ne kûçikipîr, ezxulami we i dilsoz im û min hertim

temiyin mîrzaye xwe bi cî haniye, ji dil û can pori xwe di

destirmaniya wîde sipî kiriye. Ji bo ku ez we nerihet nekim, min

birindarbûyina Pyotr Andreyîç ji we re ne nivîsî bû. Li gor ku

min bihîst, ji berketini aniha diya meya xatûn Avdotya Vasîlyevnajî

nexweş ketiye. Ji bo saxiya wi ez i banîXwedi kim. Py-

otr Andreyîç di bin milixwe îrasti de, ji singixwe birinek girti

bû û birina wî bi qasî santîmek an santim û nîveki di hvîr de

bû. Meji ber çim ew hilgirt hanî malafermandar û birina wî li

wir bi desti Stepan Karamonov î berber hate dermankirin. Sikir ji Xwedi re, Pyotr Andreyîç aniha baş bûye û kefa dili wî li cî ye. Li gor ku ti gotin, ferman dar gelek je kifxweş in. Di mali de wek ku lawe Vasîlîsa Yagorovnayi be. Divi meriv lixort negirin ku tişteki weha li seri wî qewimî. Ew birindari desti yekîjî xwe mezintir e. Hespera ku bi çar lîngan ejî, carina dilukume... We bi kerem nivîsiye ku hûn i min bikin şivani berazan, we çawa bivîstî hustiyî min li berfermana we xwar e. Silavin xwe yîn xulamti biri dikim.

Xulamî we î dilsoz

Arhîp Savelyev.»

Dema ku min nama Savelyîç dixwend, çend caran min xwe ne girt û ez kenîyam. Rewşa min dest ne dida ku ez bi xwe bersiva nama bave xwe bidim. Ê bi min, nama ku Savelyîç nivîsî bû, ew e tera behnferebûna diya min bikira.

Ji we roje û pe ve revvîşa min guherî. Marya îvanovna, em biben tew bi min re ne dipeyivî, cara ku em rastî hevî bihatana, bi her awayî dixwast ji min dûrkeve. Ez edî ji mala fermandar sar bû bûm. Hedî hedî ez hîn bûm, li mal bi tena sere xwe rûnim. Vasîlîsa Yegorovna peşîye çend cara lome ji min kirin. Le piştî ku dît ez xwe nadim ber, dev ji min berda edî.

56

Min û îvan Kûzmîç kem caran hevdu didît û ew jî ber vatîniye dibû. Be daxwaza xwe, ez û Şvabrîn jî car carina rastî hev dihatin û me bedî silav li hev dikir. Min te derdixist ku li hemberî min bi neyariyek veşartî ye, û viya jî rastiya sika min xweş dida xuyakirin. Jîyan li min teng bû bû. Tenetî û bekariye, beheviyek tarî li min radikir. Di ve tenetiye de reviya evî-

na dile min yekcar bilind dibû û her ku diçû bi min diwartir dihat. Dile min ji xwendina pirtûk û xerfldya edebiyate sar bû. Dile min teng, sere min tevlihev bû bû. Tirsê min ew bû ku ez hişê xwe wenda bikim, an jî tekevim rewşek tolaziye. Le di we navbere de bûyeren nepayî dest pe kirin û di revîştê jîyana min de gaven girîng dan havetin. Ji nişka ve hejînek bi hez û bi xer û giyane min rakir.

57

-VISERHILDANA

PÛGAÇEV

Xortino ca guh bidine me

Empîr çî bibijin ji bo we

«Ji sitraneke»

Beriya ez dest bi wan bûyeren ku min bi çav ditin, bikim, dive ez çend peyvan jî li ser rewşa Orenbûrga di dawîya sala 1773'an de, bikim.

Li derûdora vî bajare mezin û dewlemend gelek xelken nîvkûvî dijiyan ku beriya niha bi demeke kurt, desthilatiya Çaren ûrisan pejirandi bûn. Serî gave serhildayina wan, ji jiyanek rekûpek û şarizayiye beparmayina wan, paşdemayin û zordariya wan dibûn sedema hefsare dewlete ku bikari be wan hertim bindest bitebitîne. Li tiyên pewîst kele hati bûn avakirin û li van derna bi piranî kazaken ûralî hati bûn bicîkirin. Le mixabin ew H şuna ku xer û xweşiya navçe biparezin, ji demeke ye ku ew bi xwe, ji bo dewlete bû bûn hemvvelatiyên xeternak. Di sala 1772'an de, li paytextê kazakan serhildanek rabû. General Traûbenberg î ku ji bo avabiya xer û xweşiye hati bû şandin, li vir bi disîplîna xwe ya hişk ew bû bû sedema

ve serhildane. Traûnberg bi barbarî hate kuştin, erka navçe ket deste serhildaran. Le gelek ne buhurî, ev serhildana bi gulûlen topan û arihen bebext, hat serkutkirin.

Bi demeke beriya ku ez werim kela Belogorske, ev tiştana  
58

bû bûn. Wexta ku ez hatim vir, hertişt tefiya bû an jî wusa dixuya. Le ya rast, femandariye zede bi poşmanxuyakirina van serhildaran bawer ne dikir. Wan bi dilreşiya xwe ya veşartî fesalek dipan ku dîsa tevliheviyeke li dar bixînin.

Ez naha vegerim ser çîiroka xwe.

Ji şevan şevak ji destpeka çele payiza sala 1773'an li male, ez bi tena sere xwe rûniştî bûm, min guhe xwe li denge baye payize ragirti bû û ewren ku diketin ber heyve û di ser hev re baz didan, min di pencere re temaşa wan dikir. Di we gave de fermanberek hat û ji min re got, femandar gazi te dike. Ez tavile rabûm ser xwe û çûm. Şvabrîn, îvan îgnatyîç û kazak î Şrûhban li wir bûn. Le ne Vasîlîsa Yegorovna û ne jî Marya îvanovna li ode bûn. Femandar bi rewşek xemxwarî silava min hilda. Derî girt û ji bili grûhban hemî kesen li wir da rûniştin, ji berfîca xwe kaxizek dendst û got:

- Efseren berez, me nûçeyek girîng wergirt! Naha guhdar bikin be general çî nivisiye!

Berçavka xwe da ber çave xwe û xwend:

«Ji femandare kela Belogorski, Mîronov î kapîtan re,

-Bi dizîye-

Ez dixwazim bi we bidim zanîn ku: ji kazakin Doni, tikbirekî bi navi Yemelyan Pûgaçev çend roj beri, ji zindani reviyaye, bifisekî xwe di dewsa Cari me î rihmeti Petro III î mezin de

daye nasîn û çend çapûlger li xwe civandiye. Navçeye Êral rakiriye serhildani, çend kele bi dest xwe xistiye, xirab û xopan kiriyeye, agir berdaye her deri û kuştin çikiriye. Femandari berez, ji ber vi yeki bi vi birûskeya xwe, min divi ku hûn pişgiriyan pimst li vî Çar î çapûlger û derewîn bigrin û wan belav bikin. Ku ew herîşî bide ser kela di desthilatiya we de, min divi hûn wusa bikin ku wîji binîde rakin.»

Femandar berçavka xwe ji ber çave xwe kir, kaxiz tev kir û got:

- Girtina peşgiriyan pewîst! Gotin ji kirine asantir e. Wusa xuyaye ku ev çapûlgera pir xurt e. Ê di destê me de jî, bi tevayî sed û si meriv hene. Min kazak ne hejmartin... Maksimîç tu li dile xwe negire, le bawerî bi kazakan nabe. (Grûhban pi-59

şirî). Le ferman ferman e, efseren berez! Bi vatiniyan xwe bizani bin, nîgehbanan bi cî bikin û dewriyan şeve denrin, ku herîşek jî bibe deriyan kele bidin girtin û herkes biçin ba leşgeran xwe. Maksimîç, bila çave te li kazaken te be. Li tope binerîn û baş baqij bikin. Ê dive ev di kele de wusa bi dizî be ku ji naha de tu kes pe nizani be.

Piştî ku îvan Kûzmîç fermanen xwe da me, em berdan. Li ser van tiştên ku me bihîst, ez bi Şvabrîn re peyivîm û min je pirsî:

- Ka tu çî dibejî, gelo ew e dawî çawa bibe?

Wîbesivdaûgot:

- Xwede dizane, ca em binerîn. Ji naha de tiştêkî wusa girîng nabîhim, ez. Le ku...

Hevoka xwe ne qedand û bi fîkîn dest bi melodyek fransî



kir.

Ji bo ku kes bi ve nûçeye nizani be me gelekî xwe da hev, le dîsa jî li kele belav bû. Bi rastî jî jina îvan Kûzmîç ji bo wî gelekî giranbiha bû, le di ware vatiniya leşgeriye de qet ne dihat ser hişê wî ku tiştêkî dizî ji we re veke. Çer ku wî birûskeya general girti bû, bi lîstikek pisporî Vasîlîsa Yegorovna ji xwe dûndsti bû. Je re goti bû; Gerasîm î metran ji Orenbûrge xeberên gelekî seyr wergirtiye û naxwaze ji kesekî re bibeje. Çer ku Vasîlîsa Yegorovnaye ev bihistîye, rabûye ser xwe, bi lez xwe tev kiriye û çûye mevaniya mala metran. Û bi şîreta îvan Kûzmîç, Marya jî bi xwe re biri bû ku keçik bi tene li mal nemîne û behna we teng nebe.

Piştî ku îvan Kûzmîç di mal de bi tene ma bû, tavile gazi me kiri bû. û Palaska jî haveti bû paş deriye serdabe ku nikari be li ber derî raweste û guhdariya me bike.

Vasîlîsa Yegorovna beyî ku ji jina metran tu tiştêkî hîn bibe, vegeriya male. Le naha tegehişt ku dema ew ne li vir bûye, îvan Kûzmîç dere serdabe li ser Palaşkaye qûfilandiye, û civîhek li dar xistiye. Piştî ku tegehişt mere we ew xapandiye, vegeriya ser û pirs H ser pirse je kir. Le îvan Kûzmîç ji bo ve herîşe xwe amade kiri bû. Beyî ku gwîne wî biguhere û zimane wî li hev keve, bi xwînsarî bersiven jina xwe ya me-  
60

reqdar bilev kir:

- Tu dizanî, dako; di kele de jinen me xistine sere xwe ku di sobe xwe de kaye bişewutînin. Ma tu dizanî ku ev e çi xezebe li me rake! Loma min efser li hev civandin û fermanek hişk denrist ku ji vir û weha bila kaye neşewutînin. Wek ardû,

dive ezing û hejikan bişewutînin.

Vasîlîsa Yegorovnaye:

- Baş e, le te cima derî U ser Palaşkaye qufiland? got. Ca bibeje, heta ku em werin male, ew keçika reben cima di paş deriye serdabe de ma?

Îvan Kûzmîç ev pirsar qet ne dipa. Di deve xwe de kire pinepin û nizani bû ku ew e çî bigota. Vasîlîsa Yegorovna tegihîşt ku mere we tiştêkî je vedişere, le we dizani bû ku di revvşen weha de, ew e nikari be tiştêkî ji deve wî bigre. Loma jî dev ji pirsên xwe berda û mijara peyva xwe zivirand ser tirşiya xiyaren ku Akûlîna Pamfflovnaye bi babetekî taybetî dagirti bû. We şeve tu xew ne ket çaven Vasîlîsa Yegorovnaye. Li ser wî tişte ku di sere mere xwe de veşartî, her beker fikirî û fikirî.

Sibetire dema ku ji ayîna sibe dizivirî, rastî Îvan Îgnatyîç hat. Sutvane yekçav xerikî paqijiya tope bû û ew giriş, bol, pûr, kap û qirşûqola ku zarokan devvisandi bûn hundure we, derdixist.

Jina fermander xwe bi xwe fikirî û got:

« Gelo ev amadeyîyen şer çî ne? Ma dibe ku ev ji bo herî-şek Kirgîzan be? Le cima Îvan Kûzmîç van tiştên weha berûmet ji min veşere? »

Be şik biryara xwe da, we veşartiya ku bi rikebarî mereqa jintiya we le sor fikir, ji Îvan Îgnatyîç hîn bibe û le qeriya. Fena dadpirsekî ku berî ji pirsên vir û wir dest pe bike û bala tawanbar belav bike, bi çend pirsên aboriya male, we jî bala wî kişand. Dûre hinekî behna xwe girt, ji kwn de keserek kişand, sere xwe hejand û:

- Tu mezin î, Xwede! Te nûçe bihistin, ne wusa? Gelo, ew e dawî çawa bibe?

Îvan îgnatyîç:

61

- Xwede mezin e, Vasflîsa Yegorovna! Bi tera xwe me leşger hene, baruta me jî pir e, û min top jî paqij kiriye. Bi destura Xwede, em e bikari bin Pûgaçev bi şûnde bipijiqmin!

Jina fermander pirsî û got:

- Bi rastîjî ew Pûgaçeva kî ye?

Îvan îgnatyîç tavile tegehişt ku zimandirejî kir. Di leva xwe de gez kir, le bi derengî keti bû edî. Vasflîsa Yegorovnaye soz da wî ku ev tiştên bihîstiye ji kesekî re nebeje û henveha her-tişt ji bine zimane wî denrist.

Vasflîsa Yegorovna bi rastî jî li ser soza xwe sekinî û ji bilî jina metran ji kesekî re tiştekan ne got. Ewjî tene ji bo xatire ku manga we ji hela çapûlgeran ve neyete dizin, je re goti bû. Lewra çeleka we hej li beyare diçeriya.

Di wextek kurt de herkesi qala Pûgaçev dikir edî. Saloxdan babet bi babet bûn. Fermander, grûhbanî kazak şand wan gund û kelen derûdore, ji bo ku bizani be ka çi heye û çi dibe. Piştî du rojan grûhban vegeriya û da zanîn ku; bi qasî şest verstî ji kele dûr, li beyare. û li gelek deveme din wî agir dîtîye. û ji başkirdan jî bihîstiye ku bezek nenas ber bi vir peş de te. Henveha zede jî xwe pe ve berneda, lewra neweri bû H ser ve gera xwe dûr û direj bisekiniya.

Di kele de, di nava kazakan de nerihetiyek berbiçav dbcuya. Di kuçan de kom bi kom li hev diciviyên, di navbera xwe de hedî hedî tiştina dipeyvîn, le dema ku çav li sivvariyekî

an jî li leşgerekî garnîzone dixistin, tavile belav dibûn. Ji bo ve yeke sîxur peyda bûn û ketin nava wan. Kalmûkekî bi nave Yûlay i ku bû bû xiristiyan, nûçeyek girîng gihand fermander. Li gor Yûlay, ew tiştên ku kazake grûhban goti bû hemû derew bûne. Vî kazakî duru bi xwe ji hevalen xwe re gotiye ku, di vegere de ew çûye ba serhildaran, û wir pîrozbahîya xwe li seroke wan kiriye. Wijî deste xwe bi viya daye maçkirin û dûr û direj bi hev re peyivîne. Li ser ve yeke, fermander tavile grûhban zindanî kir û Yûlay girte dewsa wî. Ve guhertine di navbera kazakan de nerihetiyek berbiçavtir çekir. Bi dengekî bilind dikirin birebir. Îvan îgnatyîçe ku fermana fermander bi cî hanî bû, bi guhe xwe bihîsti bû ku ji wî re goti bûn.

62

- Kero tu e bibînî, miske garnîzone!

Femandar fikiri bû ku we roje dadpirsiya grûhbane zîhdanî bike, le wusa xuya bû bi alflcariya hevalen xwe, we roje tavi- le ji zîndane reviya bûjî.

Henveha bûyerek nû nerihetiya fermander le zedetir kiri bû. Başkirdeki, belavoken serhildane belav kiri bû û hati bû girtin. Li ser ve bûyere îvan Kûzmîç fikirî ku ji nû ve bi efseran re civîneke çeke. û xwest ku bi awakî dîsa Vasflîsa Yego- rovnaye ji mal dûncîne. Le ew merivekî ewqas rast û dilpak bû ku ji bilî awaye wî ye bere, tu tiştêk ne hat bîra wî: Bi kuxîn:

- Guhdar ke, Vasîlîsa Yegorovna, got. Dibejin ku Gerasîm î metran ji bajar nûçeyen ku di ware...

Jina wî peyva wî birî û:

- Dev ji derewan berde, îvan Kûzmîç, got. Ku te dil hebe tu civîneke rast bikî û bi efseren xwe ve beyî min qala Yemelyan

Pûgaçev bikî, ve çare ew e bi dest te nekeve!

Çav li îvan Kûzmîç fere bûn.

- Baş e dako, baş e, got. Mafir ku haya te ji hertiştî heye, we çaxe ne hewce ye ku tu biçî, em dikarin li peş te jî bipeyivin.

Jina wî bersiv da û got:

- A wusa berxe min. Ma qet tu dikarî min bixapînî!? De naha bani efseren xwe bike.

Em ji nû ve civiyan. îvan Kûzmîç li peş jina xwe, ji me re belavoka Pûgaçev xwend. Diyar bû ku belavok bi kazakekî nîvnaşî hati bû nivisandin. Çapûlger di nama xwe de dida za-nîn ku dil heye di demek kurt de baveje ser kela me. Bangî kazak û leşgeren me fikir ku xwe bavejin hela refe çapûlgeren wî. Li femandaran jî gef dixwar û digot; li hembere min ranebin, an ne hûn e bi mirinâ biarihin. Belavok bi zimanekî xav hati bû nivisîn, le bi navarokek xurt bû. Li ser meriven naşî tavile bandorek xeternak çedikir.

Vasflîsa Yegorovnaye bi qerih:

- Ca tu li vî derewçînî binere! got. Bi çi kezebe ew diweri peşniyara tiştêkî weha U me bike? Em e derkevin bergitî wî

63

biçin, xwe bavejin linge wî û em e alen xwe li ber lingen wî raxînin! Segbav! Qeye nizane ku ev çel sal e me bi şîrpakî leşgeriya xwe kiriye û sikir ji Xwede re serastiyek U vî navçeyî ava kiriye! Bi rastî jî femandare ku guhe xwe bide vî çapûlgerî heye, gelo?

îvan Kûzmîç bersivand û:

- Ez bawer nakim, dive tüne be, got. Le va em dibihîzin ku vî çapûlgerî gelek kele xistine deste xwe.

Şvabrîn:

- Bi rastî jî diyar e be çiqasî bi hez e, got û dîtinen xwe bi levkir.

Fermander:

- Le em e niha bibinin be xurtiya wî çiqas e, got. Vasîlîsa Yegorovna, ca tu nifta maxzene bide min. Îvan îgnatyîç, wî başkirdî werîne vir û ji Yûlay re bibeje bila ew jî kamçîyan bigire û were.

Vasîlîsa Yegorovnaye:

- Ravveste, îvan Kûzmîç got û rabû ser xwe. Ez Maşaye bigirim û bibim dereke. An ne, ew e denge qerîne bibihîse û bitirse. Ku tu rastiye bipirsî, ez bi xwe jî naxwazim guhdariya şikence bikim. Di xweşîye de bimîn!

Di awaye dadpirsiya kevnare de şikence ewqas cî girti bû ku, ew redara bi xer -ya ku şikence ji navîne rakir- heta demek direj jî behavil ma. Di bin şikence de lixwedanîna tawaneke, tera delile wî kesî dikir ku ew bi rastî jî tawanbar e. Ev dîtinek dûrî dîtina mafekî dadî ye, û bebingeh e . Ji ber ku çawa tavvanbarek gunehê xwe li xwe negire jî û bi vî awaye nabe beguneh; henveha ye ku gunehan li xwe dayne jî tera delile wî nake ku ew tawanbar e. Tew di roja îroyîn de jî ez dibihîsim ku hinek dadpîrs hene ku ji rabûna şikence û vî awaye barbarîye loman dîkin. Ê di dema me de, ji pewîstiya şikence sika kesî tunebû, ne ya dadpîrsan û ne jî ya tawanbaran. Ji ber ve yeke jî ev fermana fermander, bi me kesî seyr ne hat û em pe ne eşîyan. Îvan îgnatyîç çû ku başkird ji maxzene derîne û werîne. Li wir, di paş nifta jina fermander de bû. Piştî çend deqan zindanî hanin ber deri. Fermander fer-

man da ku wî bînin hundur.

Başkird bi dijwarî di şîpane re derbasî hundur bû. Ji ber ku lingen wî li qeyde xisti bûn. Koloze xwe î direj ji sere xwe kir û li ber deri sekinî. Min çare weha çavek le gerand, pirç li min bû şûjin. Ez e li dare dine vî merivî ji bîr nekim. Li dor heftesalî dbnîya. Ne poz û ne jî guhe wî hebûn. Sere wî ji bini de hati bû kurkirin. Ê ji dela rî ve , çend tayen sipî ji argûşa wî xwe berdabûn jer. Merivekî bejinkurt, jar û hinekî xûz bû. Le çave wî yen piçûk û keşayî, hej wek eđir dişewutîn. Ji ruye vvî î bi dewsa birinen xirab, fermandar tegihişt ku ew jî beşdarî serhildana 1741'an bûye û ji ber ve yeke jî hatiye arihandin. Loma bi hers got:

- Ca le binere! Xuyaye tu bere jî ketiye feqa me, güre pîr!  
Ji sere te i rindokirî jî diyar e ku ev ne serhildana te ya peşîn e. Nezflc be, û bibeje ca ke tu şandý vir.

Başkirde pîr deng ne dikir û her bi awurekî ehmeqane li fermander dineri.

îvan Kûzmîç domand û got:

- Cima tu deng nakî? Na xwe tu ûrisî nizanî? Yûlay, bi zi-  
mane we je bipirse ca ke ew şandiye kela me.

Yûlay, pirsra fermander bi tatarî duçar kir. Le başkird bi çaven vikûvala li wîjî nehirî û tu peyv ji dev derneket.

Fermander:

- Yaxşî(\*), got. Ez e niha te bidim peyivandin. Zarokno!  
Ca qutike vî tolazî je bikin û pišta wî hinekî mistin. Yûlay, tu jî wusa bike ku ranebe, ha!

Du leşgeran dest pe kirin kincen başkird je kirin. Nerihe-

tiyek li ruye vî bextreşî diyar bû. Mîna heywane ku bi nav lepe zarokan keti be, li hawirdora xwe dineri. Le dema ku ji leşgeran yekî bi piyen vî girt û havet ser milen xwe û Yûlay jî kamçî girt û ji bo ledane piyen xwe bilind kir, nalînek behele bi başkird ket, sere xwe hejand û deve xwe ji hev kir. Ji dela ziman ve, li wir perçekî goşte becir diliviya.

Îro em di bin desthilatiya Çare me î Aleksandr de dijîn, û (\*) Yaxşî: Di zimane kafkasî de wek "baş-xweş" e.

65

dema ez ve bûyera ku min bi çaven xwe ditî, bi bîr tinim; ez nikarim le neheyirim ku şarizayî ciqas zû bi ser dikeve û evîna merivatiye geş dibe. Xorto! Ku rojeke ev nivîsaren min bi dest te bikeve, ji bîr neke ku guhertinen herî baş û bingehîn, bi guvaştinen dare zore nabe. Tene bi riya serastiya xwiye meriv bixwedibe.

Em hemî sipûsar ma bûn.

Fermander:

- Baş e, got. Reng e, em e nikari bin tişteki je hîn bibin.

Yûlay, başkird dîsa bibe maxzene. Hevalen mîrza, hinek tiştên din jî hene ku em li ser bipeyivin.

Me edî dest pe kiri bû rewş di ber çav re derbas dikir. Me niherî, ji nişka ve Vasîlîsa Yegorovna bi ruyekî lihevketî û behnçikiyayî kete hundur.

Fermander bi mitûmatî pirs kir û got.

- Çi bû bi te? Ev çi hal e?

Vasîlîsa Yegorovnaye bi nalîn,

- Xezeb e aniha were ber dere me, got. Kela Nijneozerniye ve sibe girtine. Merivekî Gerasîm î metran gava din ji wir hat.



Bi çav dîtiye ku çapûlgeran çawa keke girtine. Fermandar û heme efseren wir bi dar de kirine. Leşger hemî dfl ketine. Ew xwînrijana e heta gaveke din xwe bigihînin vir.

Ve xebera nepayî sere min tev li hev kir. Min fermandare kela Nijneozerniye dinasî, xortekî bedeng û nevspîçûk bû. Bi du mehan beriya naha, bi jina xwe ya ciwan re ji Orenbûrge hati bû û li mala îvan Kûzmîç bû bûn mevan. Kela Nijneozerniye bi qasî bîst û penc verstan ji me dûr bû. Me dipa ku heta çend saetan Pûgaçev e herîşekî bîne ser me. Ji nişka ve niqutî dile min ku ew e çi bihata sere Marya îvanovnaye. Ji fermander re min got:

- Binere, îvan Kûzmîç! Vatiniya me, dive ku em heta çilka xwîna xwe ya davvîn keke biparezin. Di vî warî de min gotin nîne. Le dive em rihetiya jinan jîbifikirin. Hej ku re ne hatine girtin, wan bişîne Orenbûrge, an jî ciyekî dûrtir û ewletir ku serhildar xwe negihîne wan.

îvan Kûzmîç li jina xwe zivirî û:

66

- Deng hat te, dako. Beriya ku em û serhildaran bejne hev bibinin, ez we ji vir bişînim ciyekî ewletir, ka tu çi dibejî?

Jina kapîtan bi hers:

- Peyven vala! got. Ma keke heye ku berik negihîje? Cima kela Belogorske wek kelen din ne ciyekî ewle be? Sikir ji Xwede re ev bîst û du sal in, em li vir dijîn. Me qûna başkird û kirgizan jî dît. Ma cima li hemberî Pûgaçev em e nikari bin H ber xwe bidin?

îvan Kûzmîç:

- Baş e dako, baş e, got. Ku te bawerî bi kela me heye, bimîne.

Le em e Maryaye çi bikin? Hetanî hezen me werin, ku em bikari bin li ber xwe bidin, çê û baş e. Le ku ew xwînrijana bere kele bixin deste xwe, Marya çi dibe?

- We çaxe...

Zimane Vasîlîsa Yagorovnaye ü hev geriya, û bi xemxwarîyek mezin bedeng ma. Xwede dizane ev di jiyana fermander de cara peşîn bû ku didît peyven wî bandorek li jina wî dikir, loma domand û got:

- Na, Vasflîsa Yegorovna, dive Marya li vir nemine. Em we bişînin Orenbûrge ba diya we ya vaftiz. Bi tera xwe top û leşger li wir hene, û dîwaren wan jî ji keviran e. Ku tu guh li min bikî, tu e jî bi we re biçî wir. Gerçî tu bi sal i, le ku ew kele bi dest xwe xin, tu nizanî be ew e çi bînin sere te.

Jina fermander got:

- Baş e, em Maryaye bişînin. Le ji bo min tew xwe newestîne, ez naçim dereke. Ji vî salî şûnde cima ez te li cî binelim û ji van derina dûr, ji xwe re li gornek bi tene bigerim? Em bi hev re jiyân, em e bi hev re bimrin jî.

Femandar:

- Baş e, tu çawa dive bila wusa be, got. Le dive em naha lez bikin. Biçe, ji bo rewîtiye Maryaye amade bike. Sibe beriya berbange dive em we bi re xin. Me zede meriv jî nîne, le em e dîsa jî çend kesan pe re bi re kin. Ka Marya li kudere ye?

Jina vvî bersiv da û got:

- Li ba Akûlîna Pamfflovnaye ye. Dema bihîst ku kela Nijneozerniye hatiye girtin, gelek xirab ket û ez ditirsim ew e

67  
nexweş bikeve. Xwedeyo, ma me e ev rojana jî bidîta!

Vasflîsa Yegorovna derket û çû ku rewîtiya keça xwe tev bike. Li femandariye peyivîh hej didomiya. Le min ne tişteki digot û ne jî dikari bû guhdariya tişteki bikira edî.

Marya îvanovna bi gvvîne vemirî û bi çavwerimiya ji girî hate şîva evare. Me bedeng xwar û ji hertim zûtir em ji ser xwarine rabûn. Me xatir ji malbata femandar xwest û em li malen xwe belav bûn. Lî min bi zanetî sûre xwe li vvir ji bîr kiri bû, û ji bo hanyna wî ez bi şûnde vegeyriyam. Diniqutî dile min ku ez e Marya îvanovnaye bi tene bibînim. Bi rastî jî wusa bû. Di deve derî de bergitî min hat û şûr direjî min kir. Bi hesren çavan:

- Bi xatire we, Pyotr Andreyîç! got. Min dişinin Orenbûr-ge. Min xweşî û bextiyariya we divet. Dibe ku Xwede û ruye me binere û em dîsa hevdu bibinin, le ku em nikari bin... Kelagirî li gewriya we piçikî û ne hişt peyven xwe biqedîne. Min ew da ber singe xwe, pe ve şidand û min got:

- Riya te ya xere be, hûrîya min! Riya te vekirî be, xweşika min! Bawer bike ku çî bi sere min were jî, di behnvedana min ya dawîn de, nave te e li ser leven min be û ji bo te ez e bani Xwede bikim!

Maryaye sere xwe di ser sînge min de xwar kiri bû û digiriya. Min bi dilekî germ ji levan maçek le kir û zûzûka ez ji wir derketim.

68

-VIIHERIŞ

Ax, serimin î reben

Seri leşgeri mihir

Sî sal û sisiyin din jî

Rasterast sî û si sal  
Ji dil û bideng  
Te xulamti kirji bo Çar.  
Nepincpere, nepeyvekwes  
Ne tu bûy bextiyar  
Nejî tu rûnişti li ciyekî mezin.  
Seri min i reben,  
Tişti ku te bi destxist  
Darek sipi bilind û bilind  
Ango si çîp dar  
Ûji hefrişîm hilboqek.  
«Sitrana Gelerî»

We şeve, min ne kine ji xwe kirin û ne jî ez raketim. Min dixwest ez bi berbanga sibe re biçim ber wî deriye kele î ku Marya îvanovna e te re derketa, û li wir min cara dawîn xatir je bixwesta. Min guhertinek mezin di xwe de hîs dikir. Behntengiya min ya niha, ji we beheviya min ya bere, bi min rihetir dihat. Heviyen serîn î nezela, betewatiya daxwaza serbilindî û bi gaveke zûtir ketina nava wan xeteriyan; tevlihevî xemgîniya jihevduketine dibûn. Şev, tavile buhurî. Min dikir ku ez edî ji male derkevim, sercoxek kete hundur û da zanîn

69

ku bi şev kazakan me ji kele reviyane û Yûlay jî bi zore bi xwe re birine û li nezflcî hawirdora kele merivne nenas diçin û ten. Tavile niqutî dile min ku Marya îvanovyaye ve re ne gihandi be ku ji kele derketi be. Zûzûka min çend temî li sercoxek kirin û ez ber bi mala fermander beziyam.  
Dine rohnî dibû edî. Di kuçe de ez bi baye beze diçûm. Ji

nişka ve yekî nave min bi lev kir. Ez rawestiyam û min nehirî  
îvan îgnatyîç H pey min te û got.

- Hûn bi kudere de diçin? îvan Kûzmîç li çekxane ye û wî  
ez şandim pey we. Pûgaçev hatiye.

Bi dilhejî min pirsî û got.

- Le Marya îvanovna? Ji kele derketiye, an ne?

îvan îgnatyîç:

- Ve re ne gihandiye. Riya Orenbûrge hatiye birîn. Dor li  
kele hatiye girtin. Rewş xirab e, Pyotr Andreyîç!  
Em çûn û hilkişiyar ser çekxane. Ev der ciyekî bilind bû û  
bi qurmen daran hati bû qewfldrin. Hemû rûniştmanen ke  
kişiya bûn wir. Leşgeren garnîzone çeken xwe giredabûn û  
dipan. Top rojeke berî hati bû cîkirin. Femandar ü peş leş-  
geren xwe yen kemhejmar diçû û dihat. Nezîkiya xeteriye,  
destsivikiyek dûrî aqilan dabû vî şerkere kevnare. Li nezflcî  
kele, li beyare bi qasî bîst sivvaran dbcuyan. Diyar bû ku ew  
kazak in, le di nava wan de bi tîrdan û kolozen xwe i ji poste  
veşakan, başkird jî ber bi çavan dikelin. Femandar carek din  
jî refe leşgeren xwe di ber çav re derbas kir û got:

- Bele, ferzenden min. îro em e ji bo xatire diya xwe ya  
Çarîçe(\*) şer bikin. Em e bi hemî dinyaye bidine xuyakirin ku  
em mencas û meren xwediye sonde xwe ne.

Hemî leşgeran bi dengekî bilind dan zanîn ku li ser gotinen  
fermandare xwe ne. Şvabrîn li keleka min rawestî bû û çaven  
xwe ji heyaran ne dikuta. Siwaren ku U nav beyare digeriyan,  
çer tegetoştin ku di kele de tevgerînek heye, tavile li hev civiyan  
û bi hev şewirin. Femandar ferman da îvan îgnatyîç ku  
(\*) Di wi demi de li ser texte desthilatiya ûris Katerina II.ya

Çariçe hebû

70

bera tope bizivirihe ser koma wan û bi destê xwe cî da fitfla we û berda. Bi vîzinê gulûle bi hewa ket û beyî ku tu xisareke bide yekî, di ser wan re derbas bû û çû. Koma siwariyan bi çargavî belav bûn û li beyare tu kes ne ma.

Di ve navbere de Vasflîsa Yegorovna û Maşaya ku ne dixwest ji we biqete, bi hev re hatin çekxane. Jina fermanê ji mere xwe re:

- Ero, şer çawa diçe? got. Ka neyar li kudere ne?

Îvan Kûzmîç bersivand û got:

- Neyar ne ewqas dûr in. Le ku Xwede bibeje ere, ew e hertişt baş biçe. Çi ye Maşa, ma ditirsê keça min?

Maryaye:

- Na bavo, got, li male bi tena sere xwe betir ditirsim.

Bi ve gotine re U min nehirê û bi dijwarê pişirê. Bedii min destê xwe H qevza sûre xwe şidand. Min hani bîra xwe ku do min ev ji destê we girti bû, û her ku difikirim ez e dilgirtiya xwe bi vî şûrê biparezim, kef li min dibû kefa gur. û min xwe wek şovalyekî we didît. Ji kela dile xwe ez dişewutîm û min dixwest ez bi gavekî bere peşan bidim ku ez hejayî bavveriya we me. û betawatî ez li bende we gava daketina şer bûm. Di ve navbere de bi qasî nîv verstî ji kele dûr, li ser girekî siwariyen nû xuya bûn. û piştî gaveke, garanek meriven bi rim û tîrûkevanan tevgiredayî, H beyare belav bûn. Di nava wan de merivekî bi xeftane sor û sûre tazî, H ser piştê hespekî spî bi peş de dihat. Pûgaçev bi xwe bû ew. Hespera xwe di nava wan de sekinand. Hinek meriven wî dor le girtin, dûre çar

kes ji wan qetiyân û wusa xuya bû bi fermana wî, ber bi kele bi çargavî hajotin. Piştî nezflcbûna wan, me nehirî ku du kazaken me î caş jî di nava wan de ne. Ji wan yekî perçekek kaxiz girti bû deste xwe. Yekî din sere Yûlay î jekirî bi ser rima xwe ve kiri bû. Li ba kir, li ba kir û ber bi me virvirand hela hundure kele. Sere kalmûke reben hat li ber lingen femandar ket. Caşan kire qerîn:

- Tîrendaziye mekin! Bergitî Çar werin! Çar li vir e!

îvan Kûzmîç bi qerîn got:

- Ez e naha peşanî we bidim, kerno! Zarokno tîrendaziye  
71

bikin!

Leşgeran bi hev re ji destekî tîrendazîyek kirin. Kazake ku name pe re bû, likumî û ji hespe geri xware bû. Yen mayi, sere hespen xwe zivirandin û dan çargaviyan. Min careke weha bi çavekî li Marya îvanovnaye nehirî. Ji diyîna sere bi xwîn i Yûlay, sere we tev li hev bû bû. Ji tîrendaziye jî ker û geş bû bû û wek behiş bikeye. Femandar bani sercoxe kir û ferman daye ku kaxiza di deste wî kazake mirî de werîne. Sercoxe daket jer û çû nav beyare, tev kaxize bi devgema hespe merik jî girt û bi şûnde hat. Kaxez direjî femandar kir. Kaxiz nameyek bû. îvan Kûzmîç weha çavek le gerand, dûre çirand û havet. Di ve navbere de dixuya ku serhildaran ji bo herişekî xwe amade dikirin. Çend tîr h ber me di erde de çik bûn û çendek jî di perçine de.

Femandar got:

- Vasîlîsa Yegorovna! Kare jinan li vir tuneye. Maşaye ji vir bibe! Ma tu nabînî keçik nîvmirî bûye! Vasîlîsa Yegorovnaya

ku di bin gulebarane de çavtirsyayî bû bû, bala xwe da nava beyare û dît ku wek kuna miroyan meriv le dbribrilîn. Dûre zivirî ser mere xwe û got:

- îvan Kûzmîç, jiyân jî û mirin jî bi deste Xwede ye. Li Maşaye helal bike. Maşa were, biçe ba bave xwe!

Maşa bi gwîne vemirî û giyanî lertzok ber bi îvan Kûzmîç çû, çogen xwe da erde, sere xwe xwar kir û silav da bave xwe. Femandare bisal, se caran deste xwe di ser we re gerand, dûre pe girt û rakir, maç kir û bi dengekî nîvxeniqî got:

- Berxwedar û bextiyar bi, Maşa! Banî Xwede bike, ew te bi tene nahele. Ku tu merivekî şîrpak bibînî û pâ re bizewucî, Xwede xwîna we bi hev serîn bike. Ez û Vasîlîsa Yegorov-naye çawa jiyân, hûn jî wusa bijîh. De xwehafiz, Maşa. Vasflîsa Yegorovna, we zû ji vir bibe.

Maşaye xwe havet hustuye bave xwe û berda girî.

Vasîlîsa Yegorovna jî digiriya. Ji mere xwe re:

- Ka em jî hevdu maç bikin, got. Bi xatire te Kûzmiçe min! Ku min rojeke dile te şikandi be, li min bibore!

Femandar:

72

- Xwehafiz, dako! De bes e edî! Herdu jî biçin mal. Ku te wext hebe, sarafanekî(\*) li Maşaye bike.

Jina femandar û keça xwe bi dûr ketin. Min li pey Marya îvanovnaye dineri. Careke li paş xwe zivirî û bi sere xwe silav li min kir. Di ve navbere de îvan Kûzmîç vegeriya ba me, piştî xwe di me de kir û tevayîye bala wî li ser neyaran bû. Serhildar H dor seroken xwe civiyan û ji nişka ve ji hespen xwe daketin.



Fermander:

- Xwe baş bigirin, got. Aniha dikin ku herýş bikin.

Û pe re qerîn û hewarek daket. Serhildar wek lasereke ber bi kele herikîn. Topa me dagirtî bû. Heta ku nezflcî kele hatin, fermander ew pa û dûre ji nişka ve carek din gulûle berda.

Gulûle rast .li nava koma serhildaran keti bû. Koma serbildaran li du helan belav bûn û bi şûnde vekîşyan... Seroken wan li peş bi tena sere xwe ma bû... Sûre xwe li ba dîkir û xuya bû, dixwest wan dîsa pîj bike... Ew qerîn û hewara ku bi qasî gavekî hati bû birîn, ji nû ve dest pe kir.

Fermandar ban kir û got:

- De ferzenden min! Deri vekin û bila trampet dest pe kin! Herîş kin, zarokno! Bidin pey min!

Ez, fermandar û îvan îgnatyîç, em tavile ji çekxane daketin jer û derketin der. Le tirsek keti bû dile leşgeren garnîzone û ji ciyen xwe ne liviya bûn.

îvan Kûzmîç di ser wan de kire qerîn û:

- Hûn çi sekinîne, ferzenden min? Kare leşgeran, an serketinanjîmirine.

Di ve navbere de serhildaran xwe gihandin me û bi zor hajotin hundure kele. Denge trampete hat birîn, leşgeran çeken xwe havetin. Min hew çare dît ku ez li erde me. Le dîsa rabûm ser xwe û bi serhildaran re ketim hundure kele. Fermandar ji sere xwe birîndar bû. Naxira neyaran dor le girti bûn û je niften kele dixwestin. Min kir ku ez xwe bavejim alflcariya wî, le çend kazaken bi destûpe xwe havetin ser min, bi pisten (\*) Sarafan: Babetefâflstani geliri î ûris e.

73

xwe zende min hişkfirî giredan û qerîyan:

- Kerino, hûn e naha bibinin be meriv çawa H hemberî Çar radibestin!

Di kuçan de em ü dû xwe dikaşkişandin. Xelk, ji malen xwe derdiketin û bi nan û xwe bergitî wan dihatin. Dengê ji jama dere berz bû. Ji nişka ve ji kome, yekî kire qerîn ku; Çar li rasta qade li bende dflan e, û ku dfl sonda bav/eriyâ bi Çar bbcvvin, ew e werin bexişandin. Xelk ber bi rasta qade kişiyân, û em jî li pey wan dikaşkişîn wir. Pûgaçev H ser pelika ber dere mala fermander, li ser sandaliye rûnişti bû. Xeftanekî kazakî î sor û bi zirîç H nav piye wî bû. Koloze xwe i bi guliken zirîçîn, di ser çaven xwe de xwar kiri bû. Ji çaven wî çflc dibarîn. Ev rûçika bi min xerîb ne dihat. Rîsîpiyen kazakan dor le girti bûn. Gerasîm i metran bi gwîne vemirî û bi ricifîn li ser pelikan sekinî bû. Xaçek di deste wî de bû. Mîna ji Pûgaçev bedeng lava bike, xwe baveje bexte wî û li ber bigere ku xwîn neyete rijandin. Li we raste tavile darek sepe hat daxistin. Dema ku me nezîkayî le kir, başkirdan komasiya xelke belav kirin û em denristin peş Pûgaçev. Denge jame hate birîn. Bedengiyek giran daket ser derûdore.

Çare derewîn pirsî û:

- Ji van kîjan fermendar e? got.

Grûhbane me i kazak ji nava koma merivan derket û bi deste xwe îvan Kûzmîç peşan da. Pûgaçev bi awuren tûj U vî pîremerî nehirî û got:

- Tu çawa diwerî li hemberî min, Çare xwe rabestî?

Ji birîna xwe hele di fermander de ne ma bû, le heza xwe ya dawîn da ser hev û bi dengê xurt:

- Tu ne Çare me î! got. Ji bili diz û derewînekî, tu qet tiştekek jîninî, tegehiştî?

Enî U Pûgaçev qermiçî û bi cirek ne xweş destmala sipî ya de deste xwe de U ba kir. Çend kazakan bi vî kapîtane pîr girtin û kişandin ber dara sepe. Ew başkirde lal î ku rojeke bere me kişandi bû dadpirsiye, mîna ku li hespe siwar be, li ser dara sepe rûniştî bû. Hilboqek di dest de bû. Piştî gavekî, min dît ku îvan Kûzmîçe reben bi ben ve li ba dibe. Dûre îvan îg-74

natyîç denristin peş Pûgaçev.

Pûgaçevjeregot:

- Sond bixwe ku tu e Çar Pyotr Feodorovîç bihewînî!

îvan îgnatyîç jî ew gotinen kapîtan duçar kir.

- Tu ne Çare me i, ji bili diz û deremnekî tu qet ne tiştekek î!

Pûgaçev carek din destmala xwe li ba kir. Gelek ne buhurî, ev efsere heja jî U keleka fermadare wî bi dar de kirin.

Dob hati bû min. Min xwe amade kir ku ez jî wan gotinen

hevalen xwe yen feris bi lev bikim û min çaven xwe ji Pûgaçev

ne dikuta. Min bala xwe daye ku ez çî bibînim; sere Şvabrîn

di dore re kurkirî, xeftanekî kazakî li navpiye wî, ji nav rîsipîyen

kazakan derket, ber bi Pûgaçev çû û di guhe wî de kire

pistepist. Beyî ku Pûgaçev bala xwe bide min:

- Wî bi dar de bikin! got.

Hilboqa ben xistin hustuye min. Min dest pe kir, di dile

xwe de bani Xwede kir ku gunehen min biweşîne û sitariye li merivayen min bike.

Balbasan ji heleke ve ez dikeşandim ber dara sepe û ji heleke

ve jî her ji min re digotin:

- Netirse! Netirse!

Kî dizane, dibe ku bi rastî jî çeyî bi min dikirin. Le ji nişka ve hewarek hate guhe min.

- Rawestin! Xezeben Xwede, ravvestin!

Balbas bi qasekî sekinin. Min nehirî ku Savelyîç xwe havetiye linge Pûgaçev. Ev lalaye min î reben li ber wî digeriya û digot;

- Bave min î heja! Ma ew e bi kuştina zarokekî wusa çi bi deste we bikeve? Wî berdin. Ku we dive hûn ji bo çavtirsandine yekî bi dar de kin, fermane rakin û ji dela wî ve min, vî pîremer î reben bi dar de bikin!

Bi nîşandanek Pûgaçev, ez tavile ji ben hatim filitandin û ji min re gotin.

- Efendî û desthilate me tu bexişandî.

Ez nikarim pejneh dile xwe i we gave bi lev bikim. Min nizani bû ku ez li berdana xwe dilxweş bim, an dilreş bim. Ez keti bûm nava pejnen nelihev. Wan ji nû ve ez birim peş Çare 75

derewm û çog bi min dane erde. Pûgaçev lepe xwe î gir direjî min kir.

Li dor min çend dangan digotin;

- Maç ke, deste wî ramîse!

Le min tavvanek mirina herî xirab jî ji ve bepayetiye diçetirand. Savelyîç li paş min rawesti bû. Bi dest diqurincand mile min û di ber xwe de digot:

- Pyotr, roniya çave min! Serhişkiya meke! Ma çi dibe?

Sere xwe bixwe, bibeje û deste vî benamûs... ihe ihe... maç bike.

Min xwe ne livand. Pûgaçev piye xwe daxist û bi pişirmek tinazkerî got:

- Reng e, mîrza efendî ji kefxweşî geş bûye. Devje berdin, bila rabe ser xwe!

Wan ez rakirim ser lingan û dev ji min berdan. Ez vekişiyam kelekeke û min temaşa ve komediya xirab kir.

Xelke dest bi sondxwarina baweriye kirin. Yek li pey yekî peşde diçûn, xaç maç dikirin û dûre li peş Çare derewîn hustuxwariya

xwe dbcuyandin. Dob hati bû ser leşgeren garnîzo-

ne. Bebere kele, li wir hevrîngokek girti bû deste xwe û bi awaye kazakî sere wan sabir dikir. Dûre wan jî xwe dawdişandin,

ber bi Pûgaçev diçûn, deste wî maç dikirin. Wî jî bi wan

dida zanîn ku hatine bexişandin û henveha ew digirtin nava

refe xwe î çapûlgeran. Bi nezflcî se saetan ev tiştê her domiya.

Di dawiya dawîn de Pûgaçev rabû ser xwe. Bi rîsipîyen kaza-

kan re, ji peliken kevirîn daket xware. Hespera wî ya sipî bi zînekî

xweşik hanîn ber û bi alflcariya du kazakan le siwar hat.

Bi Gerasîm î metran da zanîn ku ew e xwarine U ba wî bixwe.

Di ve navbere de qerîna hewara jineke hat. Çend çapûlgeran

li ser pelikan Vasîlîsa Yegorovna li dû xwe di erde re dikaşkişandin.

Pore we lihevketî, kincen we diriyayî û pir ne ma bû

ku şilfutazî bibana. Ji vvan yekî, hevşoye we li xwe kiri bû jî.

Yen mayî lihefen pûrtîn, sandoqîna, destike çaye, kincen kitanî

û hemû ferûfolen male dikişandin.

Ve jinika reben bi hevvar digot.

- Ferzendino, min berdin! Min berdin bavikno!... Min bi-

76

bin ba îvan Kûzmîç!

Ji nişka ve çav li dara sepe xist û mere xwe nas kir. We çaxe bi hers û kerb qerîya:

- Bebestno! We çi bi wî kir? îvan Kûzmîç, jiyana min, leşgere min î diler! Ne sûren Prûsyayî û ne jî beriken tirkan dikari bû pişta te bida erde. Tu cima di sere şerefmendane de ne keti? Ma tu e bi deste zmdaniyekî reviyayî bihatay kuştin!

Pugaçav bi hers qerîya û got:

- Denge ve cadûkare bibirin.

Di we gave de kazakekî xort sûre xwe havet sere we û Va-sflîsa Yegorovna begîyan li ser pelikan direj bû. Pûgaçev hespe xwe hajot û xelk li pey ketin re.

77

-VIIIIMEVANE

BEWEXT

Mivani biwextji taterekîxirabtir e.

«Metelok»

Ew rasta, vikûvala ma. Ez hej di tiye xwe de sekini bûm. Li hember wan bûyeren kambax, sere min tevlihev bû bû û min nikari bû ku ez li ser tiştêkî hişe xwe berhev bikim.

Berîya her tiştî, hustuxwariya min ya zedetir ji bo Marya îvanovnaye bû. Lewra min pe nizani bû. Li kudere bû? Di çi rewşe de bû? Aya we pe re gihandi bû ku xwe li dereke veşere? Ka ciyekî ewle peyda kiri bû?..

Sere min bi ramanen wusa kefrevîn dagirtî, ez ketim hundure mala fermander. Tu kesek li wir tunebû. Sandalýna, masena, sindoqina şikandî bûn, ferûfol hati bûn pelixandin û hemû tiştên din jî bi xwe re biri bûn. Bi we pelika piçûka ku li

peş dere oda Marya îvanovnaye ve, ez bi lez hilkişiyam jor û ev di jiyana min de cara peşîn bû ku ez diketim oda we. Min nehirî, çapûlgeran lihefa we serûbinî hev kirine. Rişil hati bû şikandin û hemî tiştên di hundure we de biri bûn. Li peş dûlapen vikûvala yen ikonan, çilake hîna nîvçe nîvçe hildida.

Neynika piçûka ku di navbera herdu penceran de dardakirî, tiştêk pe ne hati bû... Le ew xwediye vî quncike berzewac û bedeng li kudere bû? Ramanek xirab wek tîrekî li sere min rabû: Min ew U peş xwe, di nav lepen çapûlgeran de dît...

78

Xwîh dawerivî çaven min, behemde min hesir ji çaven min herikî, ez girîyam û bi qerîn min nave hezkiriya xwe hilda. Di ve navbere de min xirtexirtek bihîst, bi gwînekî vemirî û bi ricifîh ji paş dûlape Palaska derket. Destên xwe li hev da û got:

- Ax, Pyotr Andreyîç! Ev çi roja reş bû li me geriya! Çi xezebe!

Betewatî min je pirsî û got:

- Le Marya îvanovna, Marya îvanovna çawa ye?

Palaşkaye:

- Xatûna piçûk dijî, got. Li mala Akûlîna Pamfflovnaye xwe veşartiye.

Tirseke kete dile min.

- Çi? Li mala jina metran! Heywax Xwede! Pûgaçev jî li wir e!

Min ji wir lez kir û min hew dît ez li kuçe me. Beyi ku ez tiştêk bibînim, bifikirim an hîs bikim, bi behneke re ez bazdam mala metran. Denge qerepere, ken û sitranan ji wir dihat. Pûgaçev û hevalên xwe kefa xwe dikirin. Palaşkaye jî bi bez dabû pey min û hati bû. Min bedeng ew şand pey Akûlî-

na Pamfflovnaye. Piştî gaveke jina metran bi şûşekê votka vala hat ber derî.

Mîna ku dile min were ber deve min û min pirsî:

- Ji bo Xwede! Bibejin, ka Marya îvanovna li kudere ye?

Jina metran bersivand û got:

- Dergûşa min, li paş navbirike di nava lihefa min de raketiye.

Ma hûn dizanin, Pyotr Andreyîç, pir ne ma bû ku xezebek

li me bibariya. Le sikir ji Xwede re, me xwe filitand. Çer

ku ew çapûlgera li ser xwarine rûnişt, hişê dergûşa min hat

sere we û naliya! Ez di tiye xwe de sipûsar bûm... Merik ew

bihîst. Pirs kir û got:

«- Ew kî ye li hundir dinale, pîrejin!»

Ez H peş vî dizî heta erde xwar bûm û min göte wî:

«- Ew xwarziya min e, ezbenî. Nexweş ketiye û ev du hefte

we ye ku di nava lihefe de ye.»

«- Xwarziya te ciwan e, an?»

«- Ere wele ciwan e, ezbenî.»

79

«- Baş e, pîrejin, Ca we xwarziya xwe raye min bide!» got.

Dile min hat ber deve min, le ez çî bikim?

«- Serçavan ezbenî» min göte. «Le keçik nexweş e, nikare

rabe û were ba efendiye me.»

«- Xem nake, pîrejin, ez e bi xwe biçim le binerim.» got.

Û ev çapûlgere çavrijiya, rabû çû paş navbirike, tu e çî bibejî!

Rûbenda lihefe ji ser rakir û wek başokekî, çaven xwe di

ser de qelişand! Le ji xera Xwede re bi şûnde vejeriya. Bawer

bike ez jî û mere min jî, me edî mirihek heri xirab dabû

ber çave xwe. Le ji Xwede giravî, kevoka min ew ne dinasî.



Xwedeyo, ev çî roj bû di ser me de hat! îvan Kûzmîçe reben!  
Ka ev dihat ser hişe ke?.. Le tew Vasflîsa Yegorovna! Le îvan  
îgnatyîç! Gur li kudere miri bû ku hûn ji mirinâ filitandin. Û  
we tew xaxe vî Aleksey îvanîç Şvabrînî dît? Pore xwe weke  
wan qusandiye, li wir rûniştiye û bi wan re vedixwe! Ew cila  
xwe ji ave derdixe, bi rastî! Û hûn dizanin, dema min qala  
xwarziya xwe û nexweşiye kir, wî bi awurekî wusa ü min nehi-  
rî ku, min got qey kerek e û di ser dile min de çik kir. Le baş  
bû ku rastiya we ne da der.

Di ve navbere de di nav denge sermestiya mevanan re,  
denge Gerasim î metran hat bihîstin. Mevanan şerab dbcvvestin  
û mere male jî banî jina xwe dikir. Dest û lingen jinika re-  
ben li hev ketin û got:

- Pyotr Andreyîç, naha biçin mala xwe. Ev ciya bi kerî we  
naye. Van çapûlgeran vexwarine û bi hewa ketine. Di ve  
serxweşiya wan de ku hûn bi nav lepen wan kevin, ew e tiştên  
nemaye bînin sere we. Bi xatire we Pyotr Andreyîç. Tişte ku  
bibe, ji xwe ew e bibe. Xwede me hemiyar sitar bike!

Jina metran ev got û wenda bû. Bi behnek hinekî fere ez  
vegeriyam male. Dema ez di rasta qade re derbas dibûm, min  
nehirî ku çend başkird li dor dara sepe diçin ten û ji lingen  
wan kesen daliqandî potinen wan derdbrin. Bi diyvvarî min  
kerba dile xwe hewand. Min dizani bû ku tekilbûyîn jî tu havilekî  
nake. Di hundure kele de, çapûlger bi vir û wir de dibeziyar  
û malen efseran dişelandin. Li her devere denge  
sermestiya serhildaran dihat bihîstin. Di dawiya davîn de

80

min xwe gihand male. Savelyîç di deve deri de li bende min

bû. Çer ku çav li min ket bi qerîn got:

- Sikir ji Xwede re! Min jî got qey wan çapûlgeran dîsa bi te girtin, Pyotr Andreyîç! Ma tu dizanî? Wan felbazan tişt bi me ve ne hiştin; kine, pirtî, ferûfol, me çi heye hemî birin. Le em çi bikin! Baş e ku wan tu berdaye. Te seroken wan nas kir, ne wusa ezbenî?

- Na min nas ne kir. Kîbû ew?

- Pyotr Andreyîç, çawa nas nakî malava! Serxweşe ku di xane de tu xapandî û kûrke ji poste kevroşk ji te girt, ma te ew ji bû- kir? Hej nipûnû bû. Heta ku bişkuvî jî, ma te ne dît be çavrijîya çawa H xwe dikişand.

Ez tenegehiştim. Le bi rastî jî Pûgaçev bi awakî berbiçav dişibiya wî rebere min î roja pûke. Edî hişe min di ber de çû ku Pûgaçev, ew meriva bi xwe bû. Ê ez naha tegehiştim ku wî cima ez bexiştandim. Min biveta jî û neveta jî, li hemberî van bûyeran û van pewendiyan wan yen seyr, ez behitî dimam; kurkekî piçûk î ku li pexasekî diyarî dibe, min ji daliqandine difiütîne; serxweşekî ku re dukute û xan bi xan diðere, naha kelan dixê bin desthilatiya xwe., û welatekîji binî de dihejîne! Savelyîçe ku dine li ser gera xwe, ew li ser xwî ye xwe ye, pirsî û got:

- Ma te şîv ne dixwar, ezbenî? Xuyaye di male de tiştekan jî tûne, le ez e dîsa jî binerim û tiştekan peyda bikim.

Dema ku bi tene mam, ez noqî ramanan bûm. Min â çi bi- kira? Kela ku naha ketiye deste vî çapûlgerî, ez te de bimînim, an ez jî bidim pey refe wî î diz? Ji bo efserekî kemasiyek mezin bû ev. Di ve rewşa dijwar de vatiniya min wusa dest dida ku li kîjan quncike vvelet bikari bim ez bi kertir bim, dive

ez li wir bim... Le evîna min, min mecbur dike ku ez li ba Ma-  
rya îvanovnaye bimînîm, we bi tene nehelim û bibim paşmere  
we. Ev diltenikiyek wusa bû ku ne dihat şikandin jî. Min baş  
dizani bû ku ev serhildana e zede nedome, le xeternakiya ku  
Marya îvanovna te de bû, dîsa jî huştu li min xwar dikir.  
Di ve navbere de kazakek bi bez kete hundur, ramanen  
min nîvçe hişt û ji min re got:

81

- Çare me î mezin te divet.

Ji bo ku ve fermana «Çar î mezin» bi cî binim, di rabûna  
xwe de min pirsî:

- Li kudere ye?

Kazak bersiv da û got:

- Li mala fermander e. Piştî nîvro efendiye me çû serşoke û  
naha behna xwe vedike. Bele ezbenî, ji hertiştî jî diyar e ku  
efendiye me, merivekî mezin e. Li ser navroje bi tena sere  
xwe du çelen berazen sorkirî daqultandiye xware. Serşok jî  
wusa daye germandin ku Taraş Kûroçkîn li mirine bûye, şalik  
daye dest Fomka BAcvayev, bi dijwarî xwe havetiye der û di cî  
de xeriqiye. Bi satilan ava sar bi ser de kirine û dûre hatiye  
ser xwe. Ere ere, ev hemû îşaren girîng in... Dibejin ku di ser-  
şoke de rengen Çariya xwe jî daye xuyakirin; li aliyekî sînge  
wî bi qasî meziniya penc kapîkan başokekî duserî û H aliye  
din jî portra wî bi xwe hebûye...

Beyî ku ez tekili qisedana kazak bim, bi wî re ez ketim riya  
mala fermander. Di re de ez ketim ramana hevdîtina xwe û  
Pûgaçev, gelo ew e çi bibûya û çawa biqediya. Ev rastiye  
berçav e ku we çaxe dile min hildavet.

Dema ku min xwe gihand peş mala fermander, dine li tarîbûne bû. Dara sepe bi qurbanen xwe ve reş û xemgm dixuya.

Laşe Vasîlîsa Yegorovnaya reben hej U jera pelika kevirîn li erde direjkirî bû û U wir du kazakan nîgehbanî dikirin. Kaza- ke ku hati bû pey min, çû hundur ku hatina min bide zanîn. Dûre tavile vegeriya, ew oda ku rojeke bere min û Marya îva- novnaye bi xweşî te de xatir ji hev xwesti bû, ez birim wir. Ez li bergehê nepayî rast hatim. Li ser maseke sermez hati bû raxistin, bi şûşe û piyalan hati bû xemilandin. Li dora we jî Pûgaçev û ji rîsipîyen kazakan bi qasî deh hevalbenden wî, bi kolozen bilind û qutiken xwe yen rengoreng rûnişti bûn. Diyar bû ku pir vexwari bûn. Ruyen hemiyar sor bû bûn û çav le dibiriqîn. Di nav wan de ne Şvabrîn û ne jî grûhbane me i kazak hebûn -ango ew caşen me.

Dema ku Pûgaçev çav li min ket:

- Wey, hûn bi xer û xweşî hatin, ezbenî! got. We serbilindî-  
82

yek da me, fermo danişin!

Hevalbenden wî xwe dan hev û ji bo min cî çekirin. Li heleke mase min bedeng xwe da erde. Li teniştî min, xortekî kazakî î bi destûpe û lihevhatî ji bo min piyalek votka dagirt, le min tew deste xwe jî pe ne kir. Bi baldarî min li ve civata dora xwe nehirî. Pûgaçev li hela serî rûnişti bû, enîşka xwe dabû ser mase, lepe xwe i gir siparti bû argûşa xwe ya bi riye reş. Tûka wî xweş û serçave wî lihevhatî bû. Tew jî dirûve kûvîtiye pe ne diket. Serî gave dizivirî ser merivekî li keleka xwe û pe re dipeyvî. Wî, ev meriv î li dor pencasalî; carina bi «Kont», carina bi «Tîmofeyîç» û carina jî bi «Apo» dinavand.

Danûstendina wan hemiyân jî bi hev re wek hevalê bû û tu girameke taybetî peşanî seroke xwe ne dikirin. Axaftina wan li ser herîşa ve sibe, serketina serhildane û li ser tevgeren rojen peş bû. Her kesî pesne xwe dida, dîtinên xwe peşniyar dikir û li hemberî Pûgaçev bi rihetî dipeyivîn. Ê bi peşniyaren ve komita leşgeriya seyr, biryar hat girtin ku bavejin ser Orenbûrge. Pir ne ma bû ku ev tevgera beronî ew e bi serketinek xirab bihata pesinandin!? Biryar hat girtin ku ew e sibe tere tekevin re.

Pûgaçev:

- Birakno, got; naha jî beriya ku em tekevin xewe, ew sitrana ku ez pirtirîn je hez dikim, em bi hev re bibejin. Çûmakov! Dest pe bike!

Ew xorte kazak î ku li tenîştê min rûniştî bû, bi dengê zirav dest bi serhevvakek kelekvanen Volgaye kir. Ê yen mayijî hemiyân pe re gotin:

Dayika min daristana şîn, meke xuşîn

Bihile bila bifikire evxorti dilir

Ez i sibi derkevîm hafa Çar,

dadpirsi herî dijwar

Ew i bipirseyek biyek, bavi me i Çar:

Bibijexorto, ca bibije gundî

Bi ki re çûy şilandin û ribiriyî

Aya te gelek hebûn heval û hevri?

83

Ez ijî bibijim: Ey bavi me i Çar

Ez iji te re yek biyek bibim rastiyî.

Min çar hevalbend hebûn:

Şeva reş û tari bû, hevali min î yekem.  
 Xençera berpişta min bû, yi duyem  
 Hevali min îsiyem, hespi min îkehil bû  
 Min hebû kevanek şidiyayî û tîrin wi  
 Ji min re bûn mizgîndar û hevali çarem.  
 Wi çaxi ew e bibeje bavi me i Çan  
 Xorti gundî aferin ji bo te  
 Evjîr û destsivikiya te  
 Baş dixuye ji dev û zimani te  
 Ji bo vi yeki ye ku ez  
 Avahiyek bilind û berz  
 Ji du sitûn û mertegekî (dara sîpi)  
 Wekxelat li ve qada hember  
 Didim çikirin ji bo te ez.  
 Bandora ku ve sitrana geleriya dilşewat li ser min danî, ne  
 gengaz e ku ez bi lev bikim. Ev sitrana li ser dara sepe, ji deve  
 merivekî ku ew e bete dardekirin dihat gotin. Dengbejan bi  
 ruye xwe yen dilsoz, bi denge xwe yen xweş û bi peyven xwe  
 yen xemgîn ev sitrana bi awakî dilşewat digotin. Ê ve yeke jî  
 yekcar pejnen helbastvaniye didewusand hundure dile min.  
 Mevanan her yekî piyalek din jî bi ser xwe de kirin, ji ser  
 mase rabûn û xatir ji Pûgaçev xwestin. Rabûm ku ez jî wek  
 wan bikim, le Pûgaçev ji min re got:  
 - Danişe, ca danişe! Min dive ez bi te re bipeyivim.  
 Em bi tene man. Bi qasekî em bedeng rûniştin. Pûgaçev  
 her zîq li min dinerî û di ve navbere de jî carna çave xwe î  
 çepe bi xwiye xwe i zexel û nebaş dişikand. Dûre ji nişka ve  
 kenekî pe girt. Ewqas ji dil dikeniya ku be dile xwe ez jî pe re

keniyam.

- Ezbenî! got, li xwe dayne, dema ku balbasen min xelesa ben havetin hustuye te, ji tirsan zirav li te qetiya, ne wusa? Ku

84

ne ji xulame te buya, naha tu bi dara sepe ve daliqandî bûy. Min tavile ew hulhuliyaya nas kir. De ka bibeje ezbenî, ma qet te bawer dikir ew merive ku we şeve heta xane re peşanî te kir, Çar î mezin bi xwe be? (Bi ve gotina xwe re quretî û wersirî li xwe xuya kir.) Li hemberî min tu gelekî tav/anbar î, le dema ez ji neyaren xwe direviyam û min xwe diveşart, te çeyiyek bi min kiri bû. Ê ji bo xatire we jî, min tu bexişand. Ca tu bisekine! Ev hej ne tiştê e. Ez careke li ser texte xwe cî bigirem, we çaxe tu e bibînî ca ez e çî yadigariyan peşkeşî te bikim! Ka tu sêze didî min ku tu e bi bîrûbawerî ji min re kar bikî?

Ev pirsê seroke çapûlgeran û dilpetiya wî ewqas bi min komik hat ku, be dil pişirîneke bi min girt.

Pûgaçev mirûze xwe tirş kir û got:

- Tu çî dipişirî? Na xwe, tu bawer nakî ku ez Çar î mezin im? Rast bibeje!

Sere min tevlihev bû. Çarîtiya çîprûtekî min nikari bû bipejiranda.

Tiştê wusa tirsonekîyek gunehkar bû, li gor min. Ê

ne tiştê baqilî jî bû, ku min li nav çave wî bineriyayê re bigota;

tu derewînek î. Ev jî xwehavetina nava eñir bû. Di bin

dara sepe de, li ber çaven xelke ew tişte ku min e ji hers û

kerba xwe bigota, aniha bi min wek pexasiyek vikûvala dihat.

Min nizani bû ku ez çî bibejim. Bi mirûzekî tirş Pûgaçev hej li

bende bersiva min bû. Di dawiya dawîn de, (û niha jî dema

ku ez we gave bi bîr tînim, sere min ji ber bilind dibe) pejna vatiniye, di min de giraniya xwe danî ser qelsiya merivatiya min. Min bersiva Pûgaçev da û got:

- Binere, ez e fikren xwe ji te re vekirî bibejim. Naha tu bi xwe bibeje, ma ez dikarim te wek Çar bihevîhim? Tu merive-  
kî baqil î, tu e tavile te derxî ku ez durûtiya dikim.

- Baş e, le ez kî me we çaxe?

- Xwede dizane be tu kî ye, le ku tu ji min bipirsî, tu lîstikek mezin dileyizî.

Pûgaçev weha bi awurekî li min nehirî.

- Ango, naha tu bawer nakî ku ez Çar Pyotr Feodoroviç im? Baş e bila wusa be. Le ma ne bi dare çö ye? Ma Grişka  
85

Otrepyev(\*) jî careke wek Çar desthilatî ne xist deste xwe? Li ser min tu çi difikirî bifikire, le min bernede. Çi hewce ye ku tu poze xwe di tiştên din re dikî? Hefsar di deste ke de be, hesp jî ye wî e. Tu min bihevîne, ji bo min bi dilûcan kar bike; ez e te bikim mereşal jî û prens jî. Hi, ka tu çi dibejî? Bi kin û kurtî:

-Na, min göte. Ji bûyina xwe de ez malmezin im, û ji bo Çarîça diya me, min sond xwariye. Ez nikarim te bihewînim. Bi rastî jî ku te dive tu çeyiyekî bi min bikî, min berde ez biçim Orenbûrge.

Pûgaçev hinekî li ser fikirî û dûre:

- Baş e, got. Ez te berdim. Le tu söze didî min ku tu e li dijî min şer nekî?

Min bersiva wî da û got:

- Ez çawa dikarim sozê wusa bidim te? Tu bi xwe jî dizanî



ku ev ne bi deste min e. Ku fermane bidine min û bibejin biçe peş wî, ez e derkevim peşiya te. Tişteki din î ku bete kirin nîne. Tu bi xwe jî serok î, ma tu naxwazî ku merive te bi ya te bikin? Ew vatiniya ku dane min, ma ez ne berpirsiyare bicflîyanîna we me? Sere min li ber te xwar e. Ku tu min berdî, mala te ava; le ku tu min bi dar de bikî, edî tu Xwede. Naha tişte ku ez rastirîn dizenim, min ji te re got.

Ji ve dilpakiya min sere Pûgaçev tevlihev bû bû. Deste xwe li piştta min da û got:

- Baş e, bila fena te be. Tu û lingen xwe. Te kudere divet biçe û te çi divet bike. Sibe were, xatir ji min bixwaze. Naha rabe biçe û bixewe, ji xwe xew ketiye çaven min jî.

(\*) Ji malmezinan, yekî bi navi Borîs Gûdonov, piştta mirina Cari ûris îvan îKambax, lavvi mjîdabû kuştin û desthilatî girti bû desti xwe. Li bi navi Grîşka Otrepyev metranekîxort, ez Dîmîtriyi lavvi îvan îKambax im, got bi vî awayî li Lehîstani meriv li dora xwe berhev kirin, dûre hajot ser Êristani û desthilatî saleke (1605 - 1606) di dest de ma. Paşîngi bi destin malmezinin ûris ti kuştin û navi Wî di dîroka ûris de bi «Dîmîtriyi Çar i deremn» ti zanîn.

86

Ez ji Pûgaçev qetiyam û derketim kuçe. Şevêker û hişkesar bû. Ronahiya heyv û histerikan daketi bû ser dara sepe û rohnî dikir.

Di kele de hemû lampe teviya bûn û her dever bi bedengiye nixumî bû. Tene di pencera meyxane re tîrejek diçûrûskî û qîrewîra meyxosên derengketî dihat bihîstin. Min çare weha bala xwe da mala metran, berbayan pencere û dere

hevşe kîp hati bûn qufilandin. Wir jî di nav bedengiyek ker debû.

Dema ku ez hatim mala xwe, ji ve derengketina min Save-lyîç tetincanî duxuya. Piştî ku xebera azadiya min bihîst, heta ku tu bize kefxweş bû. Bi gunehweşîn û dengekî bilind: -Sikir ji te re Xwede! got. Sibe zû em ji kele derkevin, ling-en xwe rakin û heta ku di me de heye em dûr biçin. Pyotr Andreyîç, ji bo te min hinek xwarin germandi bû. Naha zike xwe ter bike û mîna ku tu di paş piştta Hz. îsa de bî, heta sibe li ser piste rakeve.

Min şîreta pîremer bi cî hanî. Piştî ku min bi dilxwazî şîva xwe xwar, bi westiyaneke herawayî, min xwe li ser erde rûtûrepal direj kir û ez ketim xew.

87

-IXJIHEVDÛRKETIN

Ax, dîyina vvîruyi te  
Çi şirin bû xweşika min,  
Liji mirini jîxirabtir e  
Evjihevdûrketina!...

«Heraskov»

Sibe zû ez bi denge trampetan şiyar bûm. Ez derketim û çûm rasta qade. Ew qurbane doyîn hej bi dara sepe ve dardekirî bûn û meriven Pûgaçev li ber keti bûn reze jî. Kazak li hespen xwe siwar bû bûn û leşgeren peya jî çeken xwe gireda bûn. Ala li ba dikelin. Çend topen ku ya me jî di nav de bû, li ser duruşken textîn hati bûn bicîkirin. Hemû rûniştemanen kele li wir civiya bûn û li bende derketina Çare derevîn bûn. Li ber dere mala fermander kazakekî bi devgema hespekî

sipî û xweşik î kirgizî girti bû. Min çave xwe li Yaşe Vasflîsa  
Yegorovnaye gerand. Hinekî ber bi aliyekî kişandi bûn û hesirek  
nbcumandi bûn ser. Di dawiya dawîn de Pûgaçev ji  
hundur derket der. Xelke kum û kolozen xwe ji sere xwe ki-  
rin. Pûgaçev li ser pelika kevirîn dawestiya û silav li hemûyan  
kir. Ji rîsîpiyen kazakan yekî kêsekî tije pere sifirîn direjî wî  
kir. Pûgaçev deste xwe te de kir û mist bi mist pere di ser xelke  
de reşand. Ê xelke bi qerîn û hewar xwe havetin ser peran.  
Di ve navbere de birindar jî çebûn. Paşmeren Pûgaçev H  
dor wî civiya bûn. Şvabrîn jî di nava wan de bû. Awuren me  
bi hev ketin û wî dilverîşiya li ruye min xwendî bû. Ê loma bi  
88

neyariyek rastkîno û bi piçûkdiyrnek qastkîno bere xwe zivirand.

Di nav koma merivan de çer ku Pûgaçev çav li min ket,  
sere xwe ji min re leqand, ez banî cem xwe kirim û:

- Guhdar bike, got; naha tekeve riya Orenbûrge. Ji ostandar  
û hemû generalan re bibeje, bila heta heftekî li bende hatina  
min bin. Şîretan li wan bike ku bila bi dilovanî û  
guhnermiya zarokê bergitî min ben. An ne, ez e hemûyan bi  
dar de bikim. Riya we vekirî be, ezbenî!

Dûre zivirî ser xelke, Şvabrîn peşanî wan kir û got:

- Zaroken min! Ji vir û pe ve femandare we î nû ev e. Ji  
gotinen wî dernekevin. Li hemberî min, ew berpîrsiyare we û  
kele ye.

Dema ku min ev peyvîna bihîst, xwîn dawerivî çaven min.

Şvabrîn e biba femandare kele! Marya îvanovna e biketa bin  
desthilatiya wî! Xwedeyo, keçika reben e çi bikira, di ve rewşe  
de? Pûgaçev ji pelikan daket xware. Hesper wî hanin. Beyî

alîkariya wan kazakan ku dixwestin alîkariya wî bikin, Pûgaçev di carekî de xwe havet ser zîn.

Di we gave de min dît ku Savelyîç di nava kome de ber bi Pûgaçev çû û kaxizek direjî wî kir. Min hay je tunebû ku çî bû û ew e çî bibûya.

Pûgaçev bi livek pozbilindî:

- Ev çî ye? got.

Savelyîç bersivand û got:

- Bixwîne, tu e tebigehijî.

Pûgaçev kaxez girt, bi livek hersbûyî dûr û direj ew di ber çav re derbas kir. Dûre got:

- Te ewqas tevlihev nivisiye ku bi çave xwe yen ronî jî min tiştê ji hev dernexist. Ka sernivismende min li kudere ye?

Xortekî bi üniforma sercoxî bi lez ber bi Pûgaçev çû. Çare derewîn kaxez direjî wî kir û got:

- Bi dengekî bilind bixwîne.

Aya lalaya min ji Pûgaçev re çî nivisi bû? Ji dilpekîye cî ne diket min. Sernivismend bi dengekî bilind dest bi x\vendine kir:

«Du kirasen şeve, yekî bemboyî û yekî ji hevrişime xetxetî:

89

Şeş rûbil.»

Pûgaçev mirûze xwe tirş kir û got:

- Ev çî ye?

Beyî ku Savelyîç li xwe bigire, bersivand û:

- Ku we dive, bila bidomîne, got.

Sernivismend domand:

«Ji çûxaye tenik unîformek kesk: Heft rûbil. Pantolekî ji

çûxaye sipî: Penc rûbil. Ji kitane Holandî duwanzde qutik;  
tev bişkoven zendan: Deh rûbil. Destikekî çaye, tev qutiya  
we: Du rûbil û nîv...»

Pûgaçev:

- Ev çî peyv in! got û xwendina sernivismende xwe biri.

Min çî ji qutî, pantol û bişkoven zendan e?

Xwezî di ber Savelyîç de ma û kir ku je re kat bike:

- Bave me î xoşewîst! Wek ku hûn jî dibinin, ev lîsta tiştên  
efendiye min e ku çapûlgeran dizine.

Pûgaçev bi gefxwarin pirsî û got:

- Tu qala kîjan çapûlgeran dikî?

Savelyîç:

- Biborin, bave me, got. Ziman li min xelet geriya. Ji min  
hers nebe. Meriven te ne çapûlger in, le dîsa jî wan ev tiştana  
birin. Zevî be zîwan nabe. Destûre bidin bila heta dawiye bixwîhe.

Pûgaçevji serivismende xwe re:

- Heta dawiye bixwîne! got.

Sernivismend domand:

«Yek ji çît û yek jî ji fasûn e pemboyî, du lihef: Çar rûbil.

Çaketekî sor î bi poste rovî: Çel rûbil. Ê ya davvîn jî ew kûrke  
ji poste kevroşk î ku me dabû efendî û desthilate xwe î mezin:  
Panzdeh rûbil.»

Çflc ji ber çaven Pûgaçev firiyan û bi hers qeriya û:

- Ev çî gotin in! got.

Bi rastî jî ez gelek tirsîyam ku ew e çî bi sere vî pîremere  
reben de bihata. Xwest ku binek tiştne din kat bike, le Pûga-  
çev peyva wî biri. Ji dest sernivismend kaxiz girt, havet ser  
çave Savelyîç û bi qerin got.

- Tu çer diwerê bi van derewan min biawiqînê?' Hulhuliye geş! Çiqas guneh in, hatine şelandin! Ji bo min û meriven min, dive tu li dare dine bani Xwede bikê ku me tu û efendiye te li keleka ew yen din bi dar de ne kir. Xerifê! Kürke ji poste kevroşik, ere! Ez e naha ji poste kevroşik kurkekê bidime te, kero! Te dive ku ez li vir te bidim gurandin û ji te re kurkekê je bidim çekirin?

Savelyîç bersiv da û:

- Hustuye min li ber we xwar e, got. Le ez tene fermanberek im û berpirsiyariya tiştên efendiye min li ser min e. Wusa xuya bû ku Pûgaçev li ser hela xwe ya başiye şiyar bû bû. Sere hespa xwe veşand û beyê ku peyvek ji dev derkeve, hajot û çû. Şvabrîn û rîsîpiyen kazakan dan pey wê. Meriven wê bi rekûpekê ji kele derketin. Xelke dan pey Pûgaçev ku wê bi re kin. Ez û Savelyîç, em herdu tene li rasta qade man. La- laya min lîsta xwe girti bû destê xwe û bi xemgînê le dineri. Piştî ku dîtî bû navîna min û Pûgaçev xweş e, xwestî bû viya bi kar bine. Le bi ser ne ketî bû. Ji ber ve jîriya wê ya beker, min peyv li ruye wê xistin le kene min jî ne disekinê.

Savelyîç:

- Bikene Pyotr Andreyîç, tu bikene ezbenê! got. Em biner- in be dema ku em hertiştî ji nû ve bikirin jî, tu e bikenê an ne? Bi lez ez ketim riya mala metran ku biçim Marya îvanov- naye bibînim. Jina metran bi nûçekek xemgîn bergitê min hat. Bi şev agire Marya îvanovnaye zede bû bû. Naha jî behiş ketî bû û her pesta digot. Jina metran ez birim oda we. Hedflca ez çûm ber lihefa we. Di nava rojê de serçave we ewqas guherî

bû ku, ji tirsan pir ne ma bû zirav li min biqetiya. We ez nas ne kirim. Heta demek direj jî ez li ber sere we sekinim. Ji bo dilxweşiya min, Gerasîm î metran û jina wî tiştina digotin, le ez bawer im ku min tew guhdariya wan jî ne dikir. Ez di nava ramanen behevî de digevizîm. Her ku ez li ser revvşa ve keçika rebena bexwedî û sevvîya ku ew e bi tena sere xwe di nava lepen serhildaran bebext de bimana, difikirîm û ji heleke ve jî behezî û beçariya xwe ez difýkirîm; xwîn dadiwerivî çaven min. Le tew hebûna Şvabrîn, wî yekcar sere min tevlihevî kiri

91

bû. Ev merive ku bi fermana Çare derewîn desthilatiya kele xisti bû deste xwe, ji zû de keçika reben xisti bû çave xwe û hertişt jî ji wî dihat payîn. Min e çi bikira? Bi çi awayî min e bikari buya alîkariya Marya îvanovnaye bikira? Çawa min e bikari buya ewji nava lepe Şvabrîne xwînrij bifilitanda? Tene reyek hebû. Min biryara xwe da ku ez bere xwe bidim Orenbûrge, heta ku ji deste me be, gaveke zûtir em kela Belogorske rizgar bikin. Min xatir ji metran û Akûlîna Pamfflovnaye xwest. Ev ciwankeça ku min edî wek jina xwe dizanî bû, min sipart bexte wan. Dûre min rahişt deste ve keçika reben, maç kir û hesren çaven min di ser de rijyan.

Jina metran di rekirina min de:

- Xwehafiz Pyotr Andreyîç, got. Xwehafiz! Min hevî heye ku em e di rojen xweştir de hevdu bibînin. Me ji bû- ne kin. Heta ji deste we te, ji me re binivîsin! Ku hûn jî nebin, ev Marya îvanovna reben, ew e çiqasî bekes û bexwedî bimîne! Ez derketim rasta qade û bi qasekî sekinim. Min çavek U dara sepe gerand. Xwar bûm û min silavek le kir. Dûre ji kele

derketim, ez û Savelyîçe ku ji min ne diqetiya, em bi hev re ketin riya Orenbûrge.

Bi ramanen kwîr ez dimeşiyam. Ji nişka ve denge nalen hespan ji paş ve hat. Ez li paş xwe zivirîm, min dît ku kazakekî siwarî bi devgema hespekî vala i kirgizî jî girtî, ji dûr ve bi tevildûman te û ji heleke ve jî dest û piye xwe li me dileqand. Ez rawestiyam û min nehirî ku ev grûhbane me î kazak e. Heta ba min hat, ji hespa xwe daket, devgema hespe vala di-rejî min kir û got:

- Efendiye me! Bave me hespekî û kürke li navpiye xwe bexşîwe dike. (Kurkekî ji poste miye bi zîn ve giredayîbû.) Ê wekî din jî (Di ve navbere de grûhban peyv di deve xwe de cût) pençe kapîk bexşî... we kiri bû, le... min ew di re de ewk... kirin... wenda kirin. Li min biborin.

Savelyîç di bin çavan re le nehirî û got:

- Ango te ew wenda kirin, ere? Le ew çi ye di pistine te de dike şingeşing? Beşeref!

Beyî ku grûhban tew li xwe dayne, bersiv da û got:

92

- Ka di paşila min de çi dike şingeşing, pîremer? Ew şingeşinga devgema hespe ye, ne ya pere ye!

Min:

- Baş e, baş e! got û peyivîna wan biri. Ew kese ku tu şandý, gelek silav û sipasiyen min le bike. Ew pere ku te di re de wenda kirine jî, bike ku tu di vegere de bibîhî. Tu e ji xwe re pe votkaye vexwî.

Merik sere hespa xwe zivirand û got.

- Ez gelek sipas dikim efendiyS me. Heta mirine ez e ji bo



we banî Xwede bikim.

Bi van gotinen xwe re destekî xwe da ser sînge xwe, hespa xwe rakir çargaviya, di nava tevildûmane de ber bi kele wenda bû û çû. Min kürk li xwe kir, û ser zîn min cî da xwe û Sa-velyîç jî havet paş xwe.

Pîremer:

- Binere, tu dibînî Pyotr Andreyîç efendî; daxwaznama ku min da wî felbazî, li avare ne çû. Xuyaye, dizek li ber xwe ket. Gerçî ne ev hespe yexte î başkirdî û ne jî ev kürk î ji poste miye, bi qasî nîve wan tiştên me yen ku çapûlgeran dizîn û ew tiştên ku te bexş kirin, bi rûmet e. Le dîsa jî bi ker ten. Ji be-razan meriv çî bi dest bbrîne, baş e.

93

-XDORGIRTINA

LI KELE

Li seri çiya û zozanan danî konixwe i leşgerî  
Wek teyri eyloji bilindciyan de nihiri  
Newalin kvvîrdane kolan lipiştî sengeran  
Veşartin çekin xwe bo hirişa ivari, li ser bajir.

«Heraskov»

Dema me nezikayî li Orenbûrge kir, em rastî komek girtiyan kele hatin. Sere wan kurkurî bûn û şivedare balbasan bergehara ruye wan guherti bû. Di bin raçaviya leşgeren kele de, di avahiya sengeraran de kar dikirin. Hinekan senger dikolan û hinekan jî ew kevir û xweUya ku ji kortikan derdiket, bi teşkeran dikeşandin. Li çekxane, dîwarlekeran bi kerpîçan benda bajar çedikirin. Nîgehbanan em li ber dere kele sekinandin û şinasname me xwestin. Çer ku grûhban tegehîştin ez ji kela

Belogorske hatime, rasterast ez birim mala general.  
General li nav bexçe bû. Li daren xwe yen sevan -yen ku ji pelen baye payize rût bû bûn- dinehirî, bi alîkariya baxçevane xwe î pîr hedî hedî girişe bi kapol le dipeça. Xweşî, saxî û şadî ji ruye wî dibarî. Ji hatina min kefxweş bû. Ew kambaxbûyeren ku min bi çaven xwe dîti bû, tavile xwest ku ez je re kat bikim. Min yek bi yek hertişt je re kat kir. Pîremer ji helekî ve ji dil guhdariya min dikir û ji heleke ve jî güîdaren hişk rewane dikir.

Piştî ku min dawiya çîroka xwe ya xemgîn hani:

- Mîronove reben! got. Gelek heyf bû, gelek! Efserekî heja  
94

bû. Mîronov xatûn jî jineke gelek delal bû û ji dagirtina »ya-  
ran re di ser we re jin tunebûn, bi rastî! Le Maşa... keça kapî-  
tan, ew çawa bû?

Min bersivand û got ew li kele di bin sitariya jina metran  
de ye.

Generel bi dilşewatî:

- Wax, wax wax! got. Ev gelek xirab e! Bawerî bi paş û peşe  
wan çapûlgeran nabe. Keçika reben e li wir çi bike?

Min bersiv daye û got; kela Belogorske ji vir ne dûr e, ji bo  
xelasiya Belogorskiyen reben, hevîdar im ku hûn e di demek  
kurt de ordiyeke bişînin.

Generel bi şik sere xwe hejand û:

- Ca em binerin got. Em e dûre li ser viya bipeyivin. Min  
dive hûn werin ba min û kasikek çay vexun. Komita şewra şer  
e îro li mala me bicivin. Hûn e jî bikari bin di ware Pûgaçeve  
çapûlger û meriven wî de, me ji rastiye haydar bikin. Baş e,

naha biçin û heta we çaxe hinekî behna xwe bigirin.

Ew mala ku ez e le bimama, Savelyîç raxisti bû jî. Ez çûm wir û H bende we wexta diyar sekinim. Betewate min saeta çivine dipa. Ev civîna, civînek wusa bû ku dikari bû bandorek mezin li jiyana min bikira. Xwendevan naha baş tegehîştiye ku di we wexta bûyina çivine de ez dereng ne mame û min tavile xwe gihandiye wir.

Ji karinenden bajer yek, tew ji bere de hati bû wir. Ku ez ne xelet bim, şefe gumruke bû ev. Pîremerdekî goştîn û rûçike wî sorikî bû. Ji şîfone bi zirîç, xeftanek li nav piye wî bû.

Pirs bi pirs ez hanim ser îvan Kûzmiç û xwest ku ez kat bikim ka be çi bi sere wî de hat. Li gor gotina wî, mervatiya vaftîziye di navîna wî û îvan Kûzmîç de hebûye. Min dest bi kaýkirine kir, le serî çare wî bi pirsên xwe yen hûr û baqilane peyven min dibirî. Her çiqas ev diyariya nezaniya wî ya hunera şer ba jî, bi kemanî dida xuyakirin ku ji bûyina xwe de merivekî baqil û zîrek e. Di ve navbere de ji komita şewra şer, ew endamen din jî hatin. Ji bilî general di nava wan de kesekî leşgerî tunebû. Piştî ku wan tiye xwe girtin û ji her yekî wan re kasi-kek çay hate danîn, general dest pe kir ji ser û ber ve û bi zi-95

manekî vekirî, pirsgirek ji wan re kat kir û peyven xwe weha qedand:

- Gelî efendiyan! Ê naha jî dive em biryareke bistînin ka em e h hemberî herişen van serhildaran xwe biparezin, an em e herişe bibin ser wan. Herdu babet jî li gor xwe aliyan wan yen baş û xirab hene. Herişkirin, heviyeke mezin e ku meriv di demeke kurt de bi ser neyare xwe bikeve. Ut xweparastin,

ewletir û kemxetertir e... Naha em li gor redare, ji pirpirka herî piçûk dest pe bikin û dangan berhev bikin. (Di ve navberê de bere xwe bi min de kir.) Sutvan efendî, ji kerema xwe re dîtinen xwe bibejin!

Ez rabûm ser xwe û min berî bi kurtî qala Pûgaçev û çapûlgeran wî kir. Ê min tu şik li ser wan ne hişt ku seroke çapûlgeran, ew e nikari be li hember ordîyek rekûpek rabeste. Xweş diyar bû ku hemû karmend ji ve dîtina min ne xweş bûn. Wan, ev wek naşîtî û xwîngermiya xortekî didîtin. Denge pinepina wan bilind bû û min bi guhe xwe jî bihîst ku ji wan yekî bi dengê nîvçe got; «Bence şîr, dibe qeye ev lîstika zarokan e!».

General zivirî ser min û bi pişirin:

- Sutvan efendî! got. Di şewra şer de, dengên peşîn hertim li hela herîşbirine ten dayîn. Ev redarek e. Em naha dengdana xwe bidomînin. Ka hûn dîtinen xwe bibejin, midûr efendî! Pîremere ku xeftane şifonî bi zirîç le bû, çaya xwe ya seyemîn ku rom li nav xisti bû, di careke de daqultand xware û bersiva general da.

- Efendiye min, li gor min tew ne pewîst e ku meriv tekevin rewşek xweparezî an jî herîşbirine.

Generale ku behîtî ma, li hember derket û got:

- Ev çawa dibe, midûr efendî! An dive meriv herîş bike, an jî xwe bipareze... di taktîka şer de reyek seyemîh tûne.

- Riya kirîne bi kar bînin, efendiye me.

- Ha, ha, ha! Ev dîtinek gelek û gelek baqilane ye. Em e riya kirîne jî wek taktîkekî şer bibinin û em e li ser ve şîreta we bisekinin. Serqise; em e ji bo sere wî serseriyî, xelatek berûmet

bidin... hefte, an em dikarin heta sed rûbilî jî bidin. Ji

96

kîse ewle...

Midûr efendî peyva wî biri û got:

- Ê we çaxe, ku van serseriyên seroke xwe li resile ne xistin  
û ne hanîn, bila ez jî midûre gumruke ne, mîya kirgiz bim!

General got:

- Em e dûre dîsa dûr û direj li ser viya bisekinin. Le bi çî  
awayî dibe bila bibe, dive em dîsa jî xwe ji bo şer amade bi-  
kin. Efendîho, naha dengen xwe li gor rebaziya redare bidin.  
Hemûyan dengen xwe li dijî min dan. Hemû leşgerên karmend  
qala beheziya ordiye, ne ewleyiya serketine, xeletiya  
herîşbirinek weha kirin û tiştên wusa gotin. Hemû di we baweriye  
de bûn ku li paş top û benden kele mayîn; ewletir, çetir  
û baqiltir bû. Ev, ji dela ve şerkirina li qada şer bû.

Piştî ku generel guhdariya dîtinen hemû kesan kir, ariya  
qelûna xwe paqij kir û ev gotara da:

- Gelî efendiyan! Dive ez bidim zanîn ku dîtinen min bi  
xwe jî wek ye sutvane berez e. Levra bingehe ve dîtine hertim  
daye xuyakirin ku taktîka herîşbirine çetir e ji ya xwepareziye.  
Li vir sekinî, dest pe kir û ji nû ve qelûna xwe dagirt. Sere  
min bilind bû bû. Bi pişirmek payedarî min weha careke li  
karmendan nehirî, nerihetî û bekefiye li ruyen wan da bû der  
û di nav xwe de dikirin pistepist.

Generel hilmek kwîr li qelûna xwe xist, dûyekî pir ji dev û  
poze xwe berda û domand:

-. Gelî efendiyan! Le ez bi xwe jî ve berpirsiyarîya mezin  
nadim ber çave xwe. Lewra Çarîça me ya mezin, berpirsiyariya

xer û xweşiya vî navçeyî daye ser mile min. Ji ber ve yeke jî, ez denge xwe didim biryara piraniya dangan. Ango tevgerek baqilanetir e ku meriv di nava bajar de li bende dorgirtina neyaran bisekine, agirbaraniya topan li hember herîşa wan bi kar bîne û ku rewş dest bide, bi herîşeke wan belav bike. Ve çare jî bi pişirmen payedarî, karmendan li min dinerin. Civîna komita şewra şer qediya. Li hemberî qelsiya vî leşgerî giranbuha ez gelekî eşiyam ku li dijî dîtina xwe, guh da şevvra wan meriven di ware leşgerî de beker û naşî.

97

Di dû ve civîne re piştî çend rojan, me bihîst ku Pûgaçev li ser gotina xwe sekiniye û hajotiye ser Orenbûrge. Li ser bircen kele, min bala xwe da ordiya serhildaran. Di çav min de, ji girtina kela Belogorske û vir de hejmara wan bi deh carî zedetir bû bûn. Ew kelen piçûk yen ku Pûgaçev xisî bûn deste xwe, refe tophavejen wan jî girti bûn ba xwe. Dûre ew biryara ku şewirmenden şer girti bûn, kete bîra min, û ez tegihiştim ku ez e hej heta wextek dûr û direj jî li pist benden Orenbûrge birnînim. Ji xemxwarî kelagirî li qirika min piçikî. Ez e li vir ketina Orenbûrge kat nekim. Lewra ev ji noten malbatî zedetir, bûyerek dîrokî ye. Le tişte ku bivet ez bi kurtî bibejim ev e ku; naşîti û bekeriya karbidesten berpisiyar, bû sedema mirina rûniştemanen bajar. Diviya bûn ji her babeten birçîbûn û dijiwariye re sîngen xwe vegirtana. Orenbûrgiyan rojen gelek çetin jiyan. Herkes di nava beheviyek mezin de li bende sernivisa xwe bûn ku be ew e li kudere bisekiniya. Buhayiya tiştan, gelek û gelek bilind bû. Gulûlen topan ku U hevşen xelke diketin, ji bo wan Sdî ne tişteki ewqas xeternak

bû. Wusa ku, herişen Pûgaçev jî edî tew bala wan ne dikişand. Ji behntengî dimirim ez. Wext dibuhurî. Ji ber ku hemî re hati bûn girtin, ji kela Belogorske jî tu xeber ne dihatin. Dûrketina ji Maryaye ne dihat kişandin. Xeyalen we li ber çaven min digeriyan, her ku ez li ser jiyana we ya nediyar difýkirîm, agir bi kezeba min diket. Bi xera Pûgaçev, ez bû bûm xwedflýespekî baş. Xwarina xwe ya kem jî min bi wî re li hev par fikir, le siwar dibûm, derdiketim derveyî bajar, ew seren ku bi siwariyen Pûgaçev re dibûn, ez jî beşdar dibûm û bi vî awayî min parflcî dile xwe dihev/and. Le di van seren piçûk de serketin hertim ya wan bû. Lewra di deste wan çapûlgeran de top hebûn û wan hespen baş hebûn. Bi zike ter û sere serxweş, betirs dajotin ser me. Hezen siwariyen bajar ne di revvşa serketine de bûn. Carina hezen piyade me yen birçî jî derdiketin qada şer. Le berfa ku li çoge, je re dibû asteng ku rihet bilivin. Ji ber ve yeke jî tu havil li hezen siwariyen neyaran ne fikir. Topen me li ser benda kele li avare dikirin gurmegurm. Dema ku digîştin qada şer jî, ji ber beheletiya

98

hespen ku dikişandin, di berfe de diçikiyan û peşde ne diçûn. Taktflca me ya parezgerî di ve rewşe de bû! A ew baqilî û zanistiya ku kaimenden Orenbûrge goti bûn, ev bû!

Rojeke, nizanim bi çi awayî bû le dema ku me narirek neyar dan ber xwe û me li wan da, kazakekî ku ji hevalen xwe şûnde ma bû, min xwe gihande. Min kir ku ez sûre xwe î tirkî rakim berdim ser sere wî, le merik tavile koloze xwe ji sere xwe danî û got:

-Rojbaş, Pyotr Andreyîç! Çawa nin, hûn baş in?

Min niherî, ev grûhbane me î kazak e. Bi dîtina wî, ji kefxweşî ez dikira bifîriyama.

- Rojbaş, Maksîmîç! min göte wî. Ji kenge de tu ji Belogor-ske derketiye?

- Ez hej nûh hatime Pyotr Andreyîç; ez hej duh ji wir vegeyriyam. Nameyek we jî va ye bi min re ye.

Ji dilhejî behn U min çikiya û bi qerîn

- Ka li kudere ye? min got.

Maksîmîç deste xwe xist paşila xwe û got:

- Va ye li vir e. Min soz da Palaşkaye ku bi çi awayî dibe bila bibe, ez e we bigihînim we.

Bi van gotinen xwe re perçek kaxiza tevkirî direjî min kir û bi tevildûman ji min dûrket. Min kaxiz ji hev kir û bi behneke re ev rezen jerîn xwendin:

«Xwedi ji nişka ve desti min ji di û bavi min kir. Li dari dini idî ne di û bavi min heye ûne jîyekî ku bi desti min bigire. Ji ber ku ez dizanim hûn hertim başiya min dixwazin, û ji bo alîkariya ji her kesî re amade ne, loma ez beri xwe didim we. Ez banîXwedi dikim ku bi awayekî ev nama bigehîje deste we. Maksîmîç soz da min ku wi bigihîne we. Ê dîsa Maksîmîç ji Palaşkayi re kat kiriye ku piri daran wîji dûr ve dîtiye ku hûn ji keli derketine û ketine nava şer. Hûn xwe neparizin û ew kesin ku ji bo we hisrin çavan direjîne û ban Xwede dikin, hûn wan nafUdrinSi demek direj ez nexweş bûm. Li piştî ku ez baş bûm, Aleksey îvanîç Şvabrîn î ku dipey bavi min re li virfermandari xiste desti xwe, çavi Gerasîm î metran bi Pûgaçev tirsand û bi dari zori ez ji dest wî girtim. Naha ez di mala me de wek gir-

99



tiyeki dijîm.

Cî li min teng dike ku ez pi re bizewucim. Dibije; dema Akûlîna Pamfîlovnayi ji xwînrijan re gotiye:ev keçika xwarziya min e, wî ev derewa wi demeâstiye rasti û bi vî awayîjiyana min xelas kiriye. Li mirin ji min re çitir e ku ez ji yekî wek Aleksey îvanîç re bibim jin. Gelek çavsoriyan li min dike. Dibije; ku tu dîtina xwe neguherî û bi ya min nekî, wi çaxi ez i te bişînim ordigeha çapûlgeran. Ê «tiştin bi seri Lîzaveta Harlovayi(\*) de hatin ew i bi seri te de jî vvere» dibije. Ji bo ku ez li ser bifikirim, min ji lava kir ku hinek wext bide min. Bi si roj wext qayil bû ku ez bipem û li ser bifikirim. Li ku heta si rojan ez bi wî re nezewucim, ew e idî bi ya xwe bike. PyotrAndreyîçe min î xoşewîst! Hivîya min teni hûn in. Min bextreşe, bigirin bin sitara baskin xwe. Li ber general û hemû fermanbaran bigere, heta ku ji desti wan vvere, bila zû alîkariya hizin leşgerîji me re bişînin. Ku revvşa we dest bide, hûn bixwejî vverin vir! Ez sivviya reben, ya ku hertim li bende we.

Marya Mîronova.»

Piştî ku min name xwend û qedand, dikira ez dîn bibûyama. Min bere xwe da- bajar û heta ku ji min hat, min hespe xwe î miher zengû kir. Di re de, min sere xwe gelek di ber de eşand ku bi çî awayî ev keçika reben bete xelaskirin, le min tu reyek ne dît. Bi çargavî ez ketim nava bajar, min rasterast hajat ber mala general û wek birûske ez ketim oda wî. Generel qelûna xwe ya ji deremen sipî dikeşand û di oda xwe de ji heleke diçû hela din û digeriya. Çer ku çav li min ket, sekini. Wusa xuya bû, bi rewşa min behitî bû bû ku loma bi tertilîn sedema ve hatina min ya bewext pirsî.

- Efendiye me, aniha wek ku hûn bave min î helal bin, ez bere xwe didim we. Ji bo Xwede ji daxwaza min re nebejin na! Hemû bextiyariya jiyana min li ser ve biryara we ye.

(\*) Lîzaveta Harlova: Keça femandarekîye ku Pûgaçev bi demekîji xwe re kiriye metres û dûre bi desti kazakan hatiye kuş-tin.

100

Generel bi mitûmatî pirsî û got:

- Xer e, xoşevîste min, çi ye? Ka bibeje, ji bo te ez dikarim çi bikim?

- Efendiye me, destûre bidine min ku ez çendek leşger û pençe kazakan bi xwe re bibim û biçim kela Belogorske ji destê neyaran denrim.

Generel weha zîq li min nehirî, ez bawer im wî digot qeye viya hişê xwe wenda kiriye, û xelet jî ne difikirî. Dûre:

- Ev çi bû? got. Tu e çawa kela Belogorske ji destê neyaran denrinî?

Bi dilekî xweş ez qeriyam û min got:

- Söze didim, ez e bi ser kevim. Bes hûn daxwaza min bi cî binin.

Generel sere xwe hejand û got:

- Na, nabe xorto. Ku navber ewqas dîrkeve, ew e ji bo neyaran gelek rihet be ku pewendiyen we yen herî stratejîk bibirin. û beşik ew e bi ser kevin. Ê pewendiyen ku betin birîn...

Min î ku dît, ew dike dîsa li ser taktîca leşgerî dest bi gotareke bike, ez tirsîyam, bi lez min peyva wî biri û got:

- Keça Mîronov î kapîtan nameyek ji min re nivisiye û alîkariye

ji min dive. Şvabrîn cî li we teng kiriye ku bi wî re bizewuce.

- Bi rastî? Ew Şvabrîna jî schelmekî(\*) gelek mezin e; ku ew careke bi nav lepe min bikeve, ez edýibîstû çar saetan de wî bidim arihandin û li ser benda kele bidimber berikan! Le aniha dive em behna xwe fere bikin...

Edî wek ku min hişe xwe wenda kiri be, ez qeriyam û min got:

- Em behna xwe fere kin û ew e jî di ve navbere de bi Marya îvanovnaye re bizevuce.

Generel:

- De bila bizevuce, got. Ma çi dibe? Ji bo we jî baştir e ku aniha bibe jina Şvabrîn. Bi kemani ew e parezgerekî we hebe.

(\*) Schelm: Filbaz, xapînok

101

Piştî ku me Şvabrîn da ber berikan jî, Xwede mezin e. Bi çi awayî be jî, yek e destê xwe li Marya îvanovnaye dayne. Derî li jinebiyan vekirî ye. Ango jinebî ji keçikan rihetir dikarin ji xwe re mer bibinin!

Ji kerba xwe, min bi qerîn got:

- Ku ez bizani bim ez e bimrim jî, ez e dîsa di nav lepen Şvabrîn de nehelim we.

Generel:

- A, wer! Aniha ez tSgehîştîm... Te dil di Marya îvanovnaye de heye. We çaxe, ew... ew tişteki din e! Xorte reben! Le dîsa jî ez nikarim çendek leşger û pençe kazakan bi te re bişînim. Tevgerê wusa, kemaqiliyek herî mezin e. Ez nikarim berpirsiyariya tişteki wusa bigirem.

Min sere xwe xist ber xwe. Beheviyek mezin bi min girti bû.

Ji nişka ve tiştekek hate hişe min., û vî tiştê jî, wek ku romanivîsen kevn dibejin, ez e di beşa dahatû de kat bikim.

102

-XIORDÎGEHA

SERHÝLDARAN

Gerçî di hebûna xwe de dirende bû şer

Le naha ne ti û ne jî birçî bû ew.

Bi zamveşîpîrsîjî min:

«Tu cima hati, çikefta min?»

«A. Sumarokov»

Ez ji generel qetiyam û zûzûka çûm mala xwe. Savelyîç bi şîreten xwe yen hertimî bergitî min hat:

- Şerkirina bi van çapûlgeren serxweş re, çî digihîne te, ezbenî! Ma ev bi malmezinekî dikeve? Tu e rojeke xwe li avare bidî kuştin. Ku te li hember tirkan an jî swedîyan şer biki-ra, dîsa dibû! Le meriv nave van çîprûtan jî naynin zer zimane xwe...

Min mayîna çiqas pere xwe je pîrsî û pe peyva wî biri.

Savelyîç bi rûkenî got:

- Bi tera xwe heye, ezbenî... Herçiqas çapûlgeran hemû qulûpil serûbinî hev kirin û le gerîyan, le dîsa jî min xwe pe re gihand û ew veşartin.

Bi van gotinen xwe re kêsekî direjî hûnayî tije mejdiyên zîv ji berika xwe denrist.

- Baş e Savelyîç, min göte, tu niha nîve wan bide min û nîve wan jî bila li ba te bimîne. Ez diçim kela Belogorske.

Vî merive dilpak bi dengekî lertzok got:

- Xwedeyo, Pyotr Andreyîç î xoşewîst! Xwede bi me re be!

Çapûlgeran hemû re birine, tu e çawa biçî wir? Ku heyfa te bi te naye, qene de û bave xwe bifikire. Tu e bi kudere de biçî? Û ji bo çi? Xwe hinekî ragire, bila ordî were û wan hemû çapûlgeran bigire, we çaxe te kudere dive biçe.

Le min biryara xwe dabû. Min je re got:

- Ji bo fikirkirin û peyvîna li ser vî tiştî, wext dereng e.

Dive ez biçim, ewqas! Tu qet netirse. Ku Xwede bive, em e dîsa hevdu bibinin. Û binere, çikosiye jî meke. Te çi dive, bi se qatî buha be jî ji xwe re bikire. Ez wan pera didime te. Ku heta se rojan ez bi şûnde venegerim...

Savelyîç:

- Ev çi gotin in, ezbenî? got û peyva min biri. Ji te kira ez e te bi tene berdim! Na, ez bhnirim jî viya nikarim bikim. Ku te biryara xwe ya çûyine dabe, we çaxe bi peyatî be jî, ez e bidim dû te û werim. Ez nikarim te bi tene berdim. Di nav van diwaren kevirîn de, ez be te rûnim, ere! Sikir ji Xwede re min hej aqile xwe wenda ne kiriye! Fermana te li ser çave min, le ez ji te naqetim, ezbenî.

Min dizani bû ku çiqasî bibejim jî ew e nekeve sere Savelyîç. Ji ber ve yekî jî, min destur daye ku ew jî xwe tev bike. Piştî tî nîv saetekî ez li ser pişta hespe xwe i xwînpak bûm. Savelyîç jî li bargflekî jar û külek siwar bû bû, ew jî ji rûniştmanen bajar, yekî ji tunebûna alif ew be pere dabû wî. Em hatin ber dere bajar. Nîgehbanan em berdand û em ji Orenbûrge derketin. Hedî hedî tariye xwe dadigirt ruye erde. Riya me di ber günde Berdskaye re derbas dibû. Serkirdayetiya Pûgaçev li vî gundî bû. Re dîsa bi berfe nuxumî bû. Le ji kujekî beyare

heta kuje din, sopa sünen hespan dbcuya... Şopen ku heroj nû dibûn. Min hefsar li hespe şist kiri bû û min bi çargavî dibezand. Savelyîç bi diyvvarî li pey min dihat, serî gave li min dikire qerîn û digot:

- Hedî bajo, ezbenî! Ji bo Xwede hedî bajo! Ev yexte min î çavrijiya, nikare bi çîqdireje te î şeytan re bibeze. Pyotr Andreyîç... Xoşevîste min, Pyotr Andreyîç!.. Tu ji bo çi ewqas lez dikî? Xwedeyo, dergûşe efendiye min rasterast xwe dukuje!..

104

Gelek ne buhurî ronahiya çilayen günde Berdskaye xuya bûn. Me nezflcî li best û asegehen gund dikir. Ê ev sengera parezgeriye, ji berî de li dora gund hebû. Pilepil ji deve Savelyîç kem ne dibû, le her li pey min jî dihat. Ez di we baweriye de bûm ku em e bi xer û xweşî ji gund derbas bibûyana. Le ji nişka ve penc şeş gundiyan bi dar û ço, di tariye de derketin peşiya min. Diyar bû ku ev ji meriven Pûgaçev, nîgehbanen şeve bûn. Merikan bi dengekî ban kir, le ji ber ku min nehîniya wan nizani bû, min xwest ez bedeng di ber wan re derbas bim. Le tavile dor li min girtin û ji wan yekî hişkfirî bi devge-ma hespe min girt. Min sûre xwe kişand û berda ser sere wî. Koloze wî ew ji mirine filitandi bû. Le likumî erde û devgem ji dest xwe berda. Yen mayî jî tirsîyan bi şûnde vekîşyan. Di ve revvşa wan de min ba le hanî, hespe xwe zengû kir û wek birûske ez ji nav wan derketim.

Tariya ku reştir dibû, dikari bû ez ji her xeteriye xelas bikirama. Le min careke weha U dor xwe nehîrî ku Savelyîç ne li pey min e. Wusa diyar bû ku pîremere reben bi hespe xwe i külek ji nav lepen çapûlgeran ne fîliti bû. Min e bikari buya çi

bikira? Bi qasî çend deqan sekinim, le dûre ez pe ewle bûm ku hatiye girtin. Min bere hespe xwe bi şûnde vegerand û lezand ku ez biçim wî xelas bikim.

Dema min nezflcî li besten gund kir, ji dûr ve qîreqîrek dihat û di nav de min denge Savelyîç nas kir. Min hespe xwe ber bi we hele bezand. Ew gundiyan ku bi gavekî bere peşî li min girti bûn, piştî çend deqan ez dîsa di nav wan de bûm. Savelyîç jî li wir bû. Merikan ew ji bargfle wî peya kiri bûn û xerflc bûn ku wî giredin. Çer ku çav li min xistin pir kefa wan hat. Bi qerîn wan xwe havetin ser min û tavile ez ji hespe daxistim xware. Ji wan, yeki ku serokiya wî diyar bû, ji me re got; ez e we aniha denrim hafa Çar. Peyven xwe weha do-  
mand:

- Le ez nizanim, em e bi destura desthilate xwe, aniha we bi dar de bikin an em e tava sibe bipen...

Min zede li ber xwe ne da. Savelyîç jî wek min. Nîgehbanan bi xirecir em dan ber xwe û birin.

105

Em derbasî we hela beste bûn û ketin nava gund. Hemî xanî bi rohnî bûn. Hawirdor ji denge qerîn û heware diçingiya. Di kuçan de em rastî gelek kesan hatin, le di tariye de em bi ber çave kesekî ne ketin û kesekî nas ne kir be ez efserekî Orenbûrge me. Em rasterast birin xaniyekî li ser deve xaçere. Li ber deve derî çend boşke şerab û du top hebûn. Ji gundiyan yekî got:

- Va em hatin qesre. Ez e naha ji jor re bibejim.

Ew kete hundure xenî. Min weha çare li Savelyîç nehirî, rebeno bedeng bani Xwede dikir û guneh divveşand. Me ge-

lekî pa. Piştî demeke gundî vegeriya hat, bere xwe da min û got:

- Tekevin hundur. Desthilate me ferman da ku efsere tene biçe hundur.

Ez ketim hundure xenî, an jî bi gotina gundiyan, qesre. Dîwaren we bi kaxizen zirîç nuxumandî bû û bi du cila rohnî dibû. Texten rûniştine, mase, teştî ku bi ben ve, destika ergûn, hestîva ku li quncik, kevire ergûn, dîziken li ser sekûke û bi van hemî tiştên xwe; tu taybetiyek ve ode ji yen gund tune- bû. Xeftanekî sor li navpiye Pûgaçev, koloze bilind li sere wî, bi revvşek mezinatî desten xwe dabûn ser sînge xwe û di bine wenexaçen pîrozwer de rûniştî bû. Çend hevalen wî yen herî nezflc, bi cirxweşiyek lihevhanî U keleka wî rûniştî bûn. Diyar bû ku xebera girtina efserekî Orenbûrgî, di nava wan de bû bû tiştêkî balkeştirîn. Bi ve revvşa xwe dixwestin mezinayî û serketina xwe peşanî min bikin. Çer ku Pûgaçev çav li min xist, tavile ez nas kirim. Di dest de ev miresa wî ya lihevhanî le wenda bû.

Bi kefxweşiyek jidil û zûzûka:

- Wey efendiye me! got. Xer e we, hûn û van derina?

Min pe da zanîn ku ji bo karekî xwe i taybetî diçûm, û meriven wî ez dame sekinandine.

Ji min pirsî û got.

- Ji bo çî kare taybetî?

Min nizani bû ku ez çî bersive bidim. Min kire pinepin. Pûgaçev wusa tegehişt ku ez naxwazim H ber kesî tiştêkî bibejim,

106

loma ferman da hevalen xwe ku derkevin derve. Ji bili du kesan



herkesi bi ve fermana wî kir.

Pûgaçev:

- Tu dikarî li ber wan bipeyivî, got. Ez tiştêkî ji wan venaşerim. Min careke weha di bin çavan re li paşmeren Çare derewîn nehirî. Ji van yek kalekî rîsipî, xûz û hûrik bû. Xeftanekî boz î ji çûxaye nebaş li navpiye wî bû. Ji bilî qeytanekî heşîn î ku çeprast haveti bû milen vî xeftane xwe, min balkeşiya tişte- kî wî ye din ne dît. Le heta ku ez li dare dine sax bim, ez e ew i din ji bîr nekim. Yekî bejindirej, xurt, navpiye wî fere û li dor jiya çel û pencsalî bû. Riye wî ye tov û soravî, çave xulavî yen ku dibiriqîn, poze wî ye be firnik, çilkesoren ku li ser eni û hinariken wî, xurtiyek eceb dida vî ruyS fere û xurî. Qutikekî sor, xeftanekî kirgizî û şalekî kazakî le bû. Ez dûre tegehiş- tim ku ji van merivan: Ye peşîn Beloborodov i sercoxe bû- ye ku ji leşgeriye reviya bû-.Ye duduyan jî Afanasî Sokolov i ku bi nave "Hlopûşa" dihate nasîn, bû. Xwînriyekî dûrande bû û se.cara ji hetûnen Sibîryaye reviya bû. Di gel tevliheviya sere xwe, li ser ve civata ku ez bedii keti bûm nav, her ez difý- kirîm. Pûgaçev bi pîrsa xwe ya gavek bere, ez dîsa li min varqilandim.

- Ca bibeje ku em jî tebigehîjin; ji bo çî kari tu ji Orenbûr- ge derketî!

Di we gave de tavile ramanek nexşîn hate hişe min. Mîna ku nivisa eniya min careke din ez pergî Pûgaçev kirim û bi viya jî fesalek da min ku ez bigebijim armanca xwe. Min bi- ryara xwe da ku ez ve fesale bi kar bînim. Beyî ku ez zede li ser ve biryara xwe bifikirim, min bersivek ji dil da Pûgaçev.

- Ji bo xelasiya keçek sewî û eşiyayî, ez ketime riya Belo-

gorske.

Çav li sere Pûgaçev lîzikîn û bi hers got:

- Ji meriven min kî divvere keçek sewî bieşîne? Ku ew xwarziyê şeytîn be jî, ew e xwe ji destê min pak neke! Beje ka ew beşerefa kî ye?

Min got:

- Nave wî, Şvabrîn e. Ew keçika nexweşa ku we di mala

107

metran de dît, wî ew zindanî kiriye û cî le teng dike ku ew bi wî re bizewuce.

Pûgaçev bi livek xofdar:

- Ez e raye Şvabrîn bidim, got. Ez e hinî wî bikim, ca meriv çawa femandariye dike û xelke dieşîne. Ez e wî bidim dardekirin!

Hlopûşa bi dengê xeniqî je re got:

- Ca destûre bide min, ez ji te re tiştê bibejim. Dema ku te femandariya kele da dest Şvabrîn, te gelek pele kiri bû. Ê naha jî di dardekirina wî de tu lez dikî. Te yekî ji malmezinan hanî serokatiya kazakan û te kazak xeyidandin, û naha jî bi du peyvikan nexape, merivan nede dardekirin û malmezinan nevensiqîne.

Pîremere bi qeytane heşîn:

- Dive meriv ne dilşewate wan be û ne jî wan bibexşîne! got û dîtinên xwe bi lev kir. Xem nake, em Şvabrîn jî bi dar de bikin. Le ev nabe sedem ku em bi her awayî dadpirsiya vî efserî nekin. Ku ew te wek Çar nehewîne, tew ne hewce ye kurastiye jî ji te bipe. Le na, ku ew te wek Çar dihewîne, we çaxe li Orenbûrge di nava neyaren te de, heta roja îroyîn ew cîma maye? Ku te bive, em wî bikeşin oda dadpirsiye û hinekî dax

bikin. Ka tu çî dibejî? Ez bawer im ku wan ev efendiya ji Orenbûrge wek sîxurekî şandine.

Dîtinen vî çapûlgere pîr bi min gelek rast dihat. Dema ez fikirîm ku ez di nav lepen ke de me, ricifiyen sar bi hemî Yaşe min ket. Nerihetiya min ji çav Pûgaçev ne reviya. Çave xwe ji min re şikand û pirsî:

- Ez bawer im mereşale min rast dibe. Ka hûn çî dibejin, mîrzaye me?

Renge peyivrna Pûgaçev tirs ji ser min rakiri bû. Bi rewşek behnfere min bersivand ku ez di bin deste wî de me û ew çî bive dikare bi min bike.

Pûgaçev:

- Baş e, got. Naha ji me re bibeje, ca bajare we di çî rewşe de ye?

Min bersiv da û got:

108

- Sikir ji Xwede re, tu kemasiyek nîne.

Pûgaçev peyven min dubare kir û got:

- Tu kemasiyek nîne, ere! Ê xelk ji birçîna dimrin!

Çare derevîn rast digot. Le ji ber sondxwariya xwe, min gelek ji Pûgaçev re got, da ku ew pe ewle be li Orenbûrge bi tera xwe xwarin û vexwarin heye û ew hemû tiştên ku tene gotin jî gotinen vala ne.

Pîremer ket navîna galegale û je re got:

- Binere, tu dibînî ku li nava çave te dinere û derewan dike. Hemû kesên ku ji wir direvin û ten, bi devekî dibejin; li Orenbûrge birçîtî li qirike ye û xelk li pey Yaşên mirarbûyî di-  
derin û dixwin. Ê mîrza jî dixwaze baweriya me pe bîne ku tu

kemasiyek nine. Ku te dil heye tu Şvabrîn bi dar de bikî, qene vî xortî jî bi we dara sepe ve bidaliqîne ku dile wan yekî jî ne- mine.

Mîna ku Pûgaçev ji peyven vî pîremerî çavrijiya dudilî bû bû. Le ji xera Xwede re Hlopûşa xwe gihand heware û ji hevale xwe re:

- Ma te hej bi tera xwe serjekirin û kuştin ne kiriye, Naûmîç? got. Ev çi mexasî ye bi te girtiye? Bi xwe lingekî te li göre yek li dore ye, le çave te hej li kuştin û dardekirine ye... Ji bo dilovaniya dile te, hej te çiqas xwin dive?

Beloborodov bersivand:

- Le tu... tu çi nangenimîye dikî! Ji kengî de tu wusa diltenikî bûye?

Hlopûşa:

- Rast e, got. Min jî gelek mal şevvutand û ketim ber gunehan. Ca binere ev dest, ev dest!...

Hlopûşa kurmika xwe ya bi hestî guvaşt, piye qutike xwe hilçine jor û zenda xwe ya bi pirç denrist got:

- A ev desta jî ket ber xwîna gelek xirîstiyanan. Le ne mevanen xwe, min neyaren xwe kuştin. Ê ew jî li ser deve reyen vekirî, an jî li daristanen xewle... Ê ne bi pesindayina wusa li ber argûnan, min bi gürz û nalcox ew di erde re kirin. Wek jinen xirab ne bi pilepile...

Pîremer bere xwe bi hela din de kir û bi pinepin got:

109

- Hi, pozqertilî!

Hlopûşa bi hers:

- Tu çi dikî pinepin hulhulî! Ez e peşanî te bidim ka kî

pozqerîlî ye. Ca tu ravveste, qeye ew e wexta te jî were! Ku Xwede hez bike, tu e jî wan daxen hestîven sorkirî bibînî... Le heta we çaxe te hay ji xwe hebe ku ez riye te ta bi ta nerûçikînim!..

Pûgaçav bi livek mires û dengekî bilind:

- Gelî generalen berez! got. Bes zirezire bikin! Hemû segen Orenbûrge jî bi dara sepe ve bileqin, min xem nme; le ku herdu kuçiken me yen pîr di nav hev de bireyen û bikin bixebbc, ez e je bitirsim! De zû li hev werin!

Hlopûşa û Beloborodov beyî ku peyv ji deve wan derkeve, bi awuren tûj li hev nehirîn. Ez fýkirîm ku mijara ve axaftine biguherinîm, an ne ew e dawiya we ji bo min xirab ba. Ji ber ve yeke ez vegeriyam ser Pûgaçev û min bi dilekî xweş göte:

- Bi rastîjî bindik ma bû min sipasiya ji bo kürk û hespî ji bîr bikira ku li te bikim. Ku ji te neba, min nikari bû xwe bigihanda bajar û ez e di nîve re de ji sermaye bimrama.

Ev fikra min bi kerî tişteki hati bû. Rûkenî li Pûgaçev diyar bû. Çave xwe şikand û got:

- Çeyî, çeyiye dibine. Naha tu ji min re bibeje, ew keçika ku Şvabrîn tade le dike, çiyê te û we li ber hev heye? Dile dildaran be kul nabe, ne wusa?

Rewş baştir bû bû. Edî ne hewce bû ku min rastî veşarta.

Min rasterast bersiv da û got:

- Ew keçika dergistiya min e.

Pûgaçev bi dengekî bilind got:

- Dergistiya te! Te cima ev bere ne got? Baş e, em e te bizewucînin û dflanak xweş jî li dar xin!

Li vir vegeriya ser Beloborodov û got:

- Binere mereşal! Ev xorte ha, hevalekî min i kevn e. Em

naha rûnin û bi hev re şîve bixwin. Sibe te bi xer. Ca em şeve bibihurînin, sibe em e bineren ka em e çi bi xort bikin.

Min gelek dixwest ku ez xwe ji ve masa Pûgaçev dûr bixînim, le ji deste min tiştê ne dihat. Du keçen berzewac yen

110

kazak -keçen xwediye male- savvanek sipî li ser mase raxistin.

Nan, şorbemasî, çend şûşe şerab û avco hanin. Ev cara duduyan bû ku bi mevandarî ez bi Pûgaçev û hevalen wî yen kambax re beşdarî xwarine dibûm.

Ev gevzûşadiya ku ez bedii beşdar bûm, heta nîve şeve dom kir. Di dawîye re, giraniya meye hedî hedî li ser beşdaran diyar bû. Pûgaçev di tiye xwe de rûniştî bû û dihenijî. Hevalen wî rabûn ser xwe, îşarî min kirin ku ez jî wî bi tene binelim. Ez jî bi wan re derketim der. Bi fermana Hlopûşa nîgehbanekî

kazak ez birim oda nivistane. Savelyîç jî li wir bû.

Deri li ser me qufilandin û çûn. Li hemberî van tiştên ku qewimîn, lalaye min ewqas behitî ma bû ku tew peyvek ji dev derneket û tiştê ji min ne pirsî. Di tariye de xwe direj kiri bû. Heta demek direj jî her fikir ufîn û pifîh. Le di dawîya dawîn de denge bixepixa wî hat. Di nava ramanen kwîr de heta sibe xew ne ket çave min.

Bi fermana Pûgaçev, sibe hatin û ez ji wir birim. Li ber dere wî, taxûkek bi se hespe tatarî sekini bû. Xelk di kuçe de civiya bûn. Di deve dere xenî de ez û Pûgaçev bergitî hev hatin. Kincen rewîtiye le bûn. Kurkek li navpiye wî û kolozekî kirgizî U sere wî bû. Hevalen wî yen duh evare, dor li wî girti bûn. Ev yen ha bervajî wan bûyeren evarîn, naha bi cincvêşiyek

lihevhanî H ba hev bûn. Pûgaçev bi livek kefxweş silav h min hilda û ji min xwest ku ez jî bi wî re li taxûke siwar bim. Em le sivvar bûn û min li keleka wî cî da xwe. Devgemen hespan di dest tatarekî milfere de bû û li ser lingan rawesti bû. Pûgaçev bi ferman je re got:

- Bajo kela Belogorske!

Dile min li ser hev le xist. Hesp bi re ketin, zengilan le dan û taxûk li ser berfe nola tire peşde kişiya.

Di ve navbere de dengek hilat ku min gelek baş dinasî:

- Raweste! Raweste!

Min nehirî ku Savelyîç ber bi me dibeze û te. Pûgaçev ferman da duruşkevan ku ravveste.

- Mîrza, Pyotr Andreyîç! digot û fikir hewar. Bi ve rewşa min ya pîr, min di nava van de nehele, ev wargeha çapûl...

111

Pûgaçev:

- Ero hulhulî! got. Xwede em dîsa rastî hev hanîn, ere! De zû hilkişe keleka duruşkevan.

Savelyîç ji heleke ve cî dida xwe û ji hela din ve jî dest pe kir:

- Mala te ava Çare me, bave me! Ji bo ve dilovaniya te ya ku li hember kalekî reben î mîna min, Xwede saxî û bextiyariya jiyenek sedsale bide te. Heta mirine ez e ji bo te bani Xwede bikim û ez e edî tew qala kûrke ji poste kevroşk nekim. Vî kûrke ji poste kevroşk, di dawîya dawîn de ew e bi rastî ji Pûgaçev bieşanda. Le ji xera Xwede re Çare derewîn ev ne bihîst, an jî wek çilkek bewext dît û guh ne daye. Hespina rabûn çargaviya. Xelken ku li herdu aliyen kuçe keti bûn reze,

heta erdS xwar dibûn û bi kîrnûşî silav li Pûgaçev dikirin. Wî jî bi sere xwe silav dida herdu aliyan. Gelek ne buhurî, me gund li cî hişt, em ketin ser rastereyeke û bi bezek xweş em çûn.

Meriv baş te derdke ku di we gave de ez çî difýkirîm. Piş-tî çend saeten din min e delala ber dile xwe bidîta; ew delala ku ji min kira min ew wenda kiri bû edî. Ew gava ku me e dîsa hevdu bidîta, min dihanî ber çaven xwe. Ê ji heleke ve jî min fikra vî merive ku sernivisa min di destan de, dikir. Ev merive ku ji bo xelasiya dildara min ketiye re, bi zordarî û xwîye xwe i xwînrijî hate bira min! Wî pe nizani bû ku dergis-tiya min keça Mîronov î kapîtan bû. Ku behna Şvabrîn teng bibûya, dikari bû hertişt ji Pûgaçev re bigota. Pûgaçev dikari bû bi awayekî din jî ev rastiya denrista hole... We çaxe ew e çî bihata sere Marya îvanovnaye? Bi van ramanan re ricifiyen sar digirte Yaşê min û por li sere min pij dibû.

Ji nişka ve bi pirseke Pûgaçev ez li xwe varqilîm û xeyalen minlicîman.

- Aya efendiye me cima weha difikire?

Min bersivand û got:

- Ma ez nefîkirim, le kî bifikire? Ez efserekî ji malmezinan im. Ma hej doh min li dijî te şer dikir û îro ez di taxûka te de

112  
li teniştê te rûniştî me. Ê tew bextiyariya jiyana min jî di dest te de ye.

Pûgaçev ji min pirsî:

- Çi ye, ma tu ditirsî?

Min je re got, te ez careke bexişandim û aniha jî ne ku tene



min xwe havetiye bexte te, henveha alîkariya te jî ji min re bûye hevî.

Desthilat got:

- Tu jî rast dibejî, bi Xwede tu jî rast dibejî! Te dît be meri-  
ven min çawa di bin çavan re li te dinerin. Pîremer îro jî çelî  
sîxuriya te dikir û digot, dive bete şikencekirin û dardekirin.  
Le ez bi ve yeke qayil ne bûm. (Ji bo ku Savelyîç û tatar i du-  
ruşkevan nebihîsin, bi dengekî nizm le zede kir û got:) Ew  
piyala şerabe û kürke ku te da min, hat bîra min loma. Tu jî  
dibînî, mîna ku di nav we de te gotin, ez ne xwînxwarekî ewqas  
hov im.

Ketina kela Belogorske hat ber çave min, le min qet tiştê  
ne got. Lewra min pewîst ne dît ku ez bi wî re tekevim heftûheşte.

Piştî bedengiyek kurt, Pûgaçev pirsî û got:

- Li Orenbûrge, li ser min çi dibejin, gelo?

- Dibejin, meriv nikare bi wî re qayîşe bikeşe. Bi rastî jî te  
xwe da xuyakirin ku tu kî ye.

Pejnen serbilindiye U ruye Çare derewîn belav bûn û bi rûkenî:

- Wusa ye, got. Şerkerekî baş im ez. Ma di nav Orenbûrgiyen  
we de, tew qala sere Yuzeyev nakin? Çel general li wir  
hatin kuştin û çar ordî jî dfl ketin. Ka tu çi dibe, ma keye Prûsyaye  
dikari bi min re derkeve serî?

Ev virekiya çapûlger li peşka min hati bû û min göte.

- De ka tu çi dibe, te e bikari buya ji heq Frederîck derketay?

- Ji heq Feodor Feodorovîç? Cima ji heq dernekevim? Va  
ye ez ji heq generalen we derdikevim? Ê van yen ha ji li wî  
xistine, ne wusa? Heta naha deve çeka min serketin verişiye.

Ca tu raweste, ku ez çare bajom ser Moskvaye, we çaxe tu bi-

bine, ew e hîn çî bibe!..

- Ma difikirî ku tu ber bi Moskvaye biçî?

Pûgaçev hinekî fikirî, dûre hedflca got:

- Xwede dizane. Ciye min teng e. Wek ku min dive, ez ni-  
karim xwe bihvînim. Meriven min serhişkiya dîkin. Diz û çap-  
pûlger in ew. Dive ez hefsare wan şist nekim. Ku tengasiyek  
biqewume û ez bilikumim, ji bo xelasiya sere xwe, ew e sere  
min bifroşin.

Min ji Pûgaçev re got:

- Binere, tu bi xwe dibini! Ma ji bo te ne çetir e ku tu di  
wexte de, bi daxwaza xwe dev ji wan berdî û xwe bavejî bexte  
dilovaniya Çariçeye?

Pûgaçev bi dilekî şewutî kenîya û got:

- Na, ji poşmaniya xwe ez dereng ketim û ji xwe bexşa min  
jî nabe edî. Bi çî awayî min dest pe kiriye, ez e wusa jî bidomînim.  
Ki dizane, te hew nehirî ku ez bi ser jî ketim! Ma carekî  
Grîşka Otrepyev Moskva ne xist bin deste xwe!

- Ê dûre jî tu dizanî be çî hat sere wî, ne wusa? Ji pencera  
qesre de havetin xware, perçe perçe kirin, şewutandin, ariya  
wî dewisandin deve topeke û teqandin.

Tiştên ku di we gave de hatin bîra Pûgaçev, bi pejneke kûvî  
û biryarek xort:

- Guhdar ke! got. Ez e xevroşikekî ji te re kat bikim. Di zaroktiya  
xwe de, min ji pîrejineke kalmûk guhdar kiri bû. Rojeke  
eylo ji qijalekî re gotiye: «Birake qijalek, ca bibeje, cima  
tu li ve dine se sed salan dijî û ez jî tene sî û se salan dijîm?»  
Oijalekî bersiviye û gotiye: «Ji ber ve yeke ye, xoşewîste min,

tu xwîna teze vedixwî û ez jî berate dixwim.» Eylo hinekî daye ber hev, daye ser hev û dûre gotiye: «Baş e, ca ez jîbi te re xwarina berate biceribînim.» Rabûne û bi hewa ketine. Dûre berate hespekî li jer dîtine û hatine li ser venîştine. Oijalekî ji heleke ve berate nikul kiriye û ji heleke ve jî pesne tama wî daye. Eylo jî careke duduyan nikul kiriye, bi şûnde tuf kiriye, perazing li xwe xistiye, bi hewa ketiye û ji qijalekî re gotiye: «Na birake qijalek, yek careke vexwarina xwîna teze, gelek çetir e ji jiyîna se sed salen bi berate. Ê dûre jî

114

Xwede mezin e. De ka ji ve xevroşika kalmûke re tu çi dibejî, ezbenî?

Min göte:

- Gelek xweş e. Le li gor min jîyîna bi kuştin û çapûlgeriye jî, nikulkirina berate ye.

Pûgaçev bi mitûmatî li min nehirî û qet tişteke ne got. Em herdu jî ketin nava ramanen xwe û bedeng man. Tatara duruşkevan dest haveti bû sitranek xemgîn. Savelyîç dihenijî û di tiye xwe de li ve hele û we hele dihejiya. Taxûka li ser ve riya rast û bi berf, wek ku bifire diherikî... Ji nişka ve perçin û hola jama günde li keleka asegehen Êrale ber bi çave min ketin... Ê piştî panzde deqan me hajot hewşa kela Belogorske.

115

-XIIKEÇIKASEWÎ

Ev şirta dara meya sivi

Ne xulfheye nepeli vvi

Ev bûkika civvanikjî

Ne bav heye ne jî di

Ne zîv û ne ziri vvi

Ne nas û ne kesin vvi...

«Dîlanek govende»

Duruşkevan hajot ber peliken mala fermander. Xelke ku denge zengilen Pûgaçev nasî bun, li pey me dibeziyan û dihatin.

Şvabrîn li ser pelikan bergitî desthilate xwe hat. Wek kazakekî

xwe tev şidandi bû û rî berda bû. Ji bo nangenimiye,

bebext çend peyv gotin û alflcariya Pûgaçev kir ku ji taxûke

dakeve xware. Çer ku çav li min xist mitûmat ma, le tavile li

xwe varqilî. Deste xwe direjî min kir û got:

- Tu jî hati û ketî nav me, ere? Tu dereng jî mayî!

Beyi ku tu tişteki bibejim, min bere xwe je zivirand.

Dema em ketin hundure we oda bi bîranînen germ, dile

min di bîr ve çû. Diploma femandare rihmetî, wek beryade

gorneke hej bi dîwer ve dardekirî bû. Pûgaçev li ser dîwançe

rûnişt, dîwança ku di demen pilepila jina xwe de îvan Kûzmîçe

reben gejdibû û diçû li ser xûmajî dibû. Şvabrîn çû bi de-

ste xwe je re votka hanî. Pûgaçev piyalek daqultand, dûre ez

peşan dam û got.

- Ji efendiye me re jî kerem bike.

Şvabrîn tev berkeşoka xwe ber bi min hat. Le min cara du-

116

duya bere xwe ji wî zivirand. Baş xuya bû ku di nava nerihe-

tiyek mezin de ye. Bi deqdorîya xwe ya hertimî, beguman ew

tegebişti bû ku Pûgaçev je ne xweş e. Ji awuren wî ditirsiya, le

carina jî di bin çavan re bi şik li min dimeyizî. Pûgaçev rewşa

kele, gotin û saloxen ku li ser hezen neyer tene peyivîn, û tiş-

ten weha jî wî guhdar kir. Dûre di wextek nepayî de je pirsî û

got:

- Ka bibeje birako, ew keçika kî ye ku te havetiye paş derî.

Ca we peşanî min bide.

Gwîne Şvabrîn bû wek xwelî û bi dengekî lertzok got:

- Desthilate min.. femandare min, min ew ne havetiye paş derî, ew... nexweş e, di oda xwe de ramediyaye.

Desthilat rabû ser xwe û got:

- Min bibe ba we.

Şvabrîn tu re ne dît ku xwe je pak bike. Rabû ji beçarî Pûgaçev bir oda Marya îvanovnaye. Ê ez jî li pey wan diçûm.

Şvabrîn li ser pelikan sekini û got:

- Desthilate min, we çi ji min dive bive, di desthilatiya we de ye. Le icaza yekî biyanî nedin ku tekeve oda jina min.

Ez lerizîm:

- Tu zewuciye jî, ne wusa! min göte û min kir ku ez dest bi-kim gewriya wî.

Pûgaçev ji min re:

- Tu deng meke! got. Ev kare min e.

Dûre zivirî ser Şvabrîn û je re got:

- Zimandirejîye meke û xwe li naz nexîne! Jina te be jî ez e tekevim hundur û ez ke bixwazim jî dişinim ba we. Bide pey min efendî!

Di deve dere ode de Şvabrîn dîsa rawestiya bi heviyek dawîn û dengekî nîvçe got:

- Deshilate min, min dive ez ji nuha de bi we bidim zanîn ku agire we le rabûye û ev se roj in her behiş dipeste.

Pûgaçev:

-Derîveke! got:

Şvabrîn dest di berike xwe de kir û li nifte geriya. Le dûre got min bi xwe re ne haniye. Pûgaçev pehnek li deri xist, derî 117

vebû û em ketin hundur. Min çave xwe li hundure ode gerand, ez di cî de sipûsar bûm. Fîstanekî qetiyayî ye gundiyan li Marya îvanovnaye û Û quncikekî rûnişti bû. Gwîne we zer bû bû, jar bû bû û pore we li nav hev keti bû. Li peş we kwîzekî ave û li ser deve kwîz jî perçekek nan hebû. Çer ku keçika reben çav li min ket, ricifî û qeriya. Aniha nikarim bi lev bikim ku we çaxe min çi kir.

Pûgaçev bi awuren tûj li Şvabrîn nehirî, bi pişirmek xemgîn got:

- Te nexweşxaneyek baş heye!

Dûre ber bi Marya îvanovnaye çû:

- Ca bibeje kevoka min. Ev mere te cima te wusa diarihîne? Te çi gunehkarî kiriye li hemberî wî?

Marya îvanovnaye:

- Mere min! got. Ew ne mere min e. Li dare dine ez e bi wî re nezewucim! Ku kesek nikari be min je xelas bike, min bi-ryara xwe daye ku ez xwe bikujim.

Pûgaçev bi çavekî kuştine li Şvabrîn nehirî û got:

- Tu çawa diwerî li min derewan bikî! Bepaye! Tedigehijî ku te aniha çi li xwe heq kiriye?

Şvabrîn çog dan erde û xwe havet bexte wî. Di we gave de min bi çavekî wusa dilverşîn le nehirî ku, ew kerba hundure min jî li ber wenda bû. Vî malmezine ku xwe haveti bû linge serxweşekî, awuren dilverişîn dagirti bû çaven min.

Behn li Pûgaçev fere bû û got:

- Ve çare ez te dibexşim. Le tu ji bû- nekî ku ji vir û pe ve, çî gunehkariya ku tu bikî, evv e evjî le zede be.

Dûre vegeriya ser Marya îvanovnayê û bi zarxweşî je re got:

- Keçika xweşik, rabe biçê derve. Ez azadiya te bexşî te dikim. Ez Çar im.

Marya îvanovnayê bi lez li wî niherî, û tavile tegehişt ku ev merive li peş we, xwîniye de û bave we ye. Bi herdu desten xwe ruye xwe veşart û behiş gerî erde bû. Min xwe havet ser ku ez hemez bikim, le di we gave de destirmana we ya bere, Palaska kete hundure ode û bi merane xwe da ber alîkariya

118  
xatûna xwe. Pûgaçev derket. Em herse jî daketin oda mevanan. Çar bi ken got:

- Bele efendiye me! Te keçikek xweşik bi dest xistiye, bi rastî. Ka tu çî dibe? Em bişînin pey metran û em mara xwarziya wî pe bidine birîn. Ez e bibim dîdevane we û bila Şvabrîn jîşoşpaniye bike. Em e bbcvvin, vexwin û kefa xwe bikin! Tişte ku ez je ditirsiyam, hat sere min. Peşniyara Pûgaçev, wek kerekî li ser dile Şvabrûy keti bû. Bi rewşek behişî û dengê lertzok:

- Desthilate min! got. Min nebaşî kir ku min derew li we kir. Le Grûyyov jî we dixapîne. Ev keça ne xwarziya mala metran e. Ew keça îvan Mîronov e, kapîtane ku we di girtina ve kela Belogorske de bi dar de kir.

Pûgaçev bere xwe da min, bi awuren tûj li min nehirî û bi mitûmatî:

- Ev çî ye? got.

Beyî ku ez tew xwe bilivinîm, min bersiv da û got:

- Şvabrûy ji we re rastî got.

Pûgaçev tengijî û got:

- Le te ev bere ji min re ne goti bû!

Min bersivand û got:

- De ka tu bi xwe bifikire, ma min li ber meriven te dikari bû bigota ku keça Mîronov hej dijî? Wan e tavile bikuşta. Ew e kesekî nikari buya ew xelas bikira.

Pûgaçev bi ken:

- Tu jî rast dibejî, got. Dile serxweşen min e tew bi keçika reben neşewutiya. Deqдора jina metran baş kiriye ku ew xapandine.

Piştî ku min nehirî ew behnfere dixuye, we çaxe min je re got:

- Binere, ez nizanim be ez te bi çi binavînim û naxwazim bizani bim jî. Le Xwede jî pe dizane ku, ji bo ve alîkariya te, ez amade me cane xwe jî bidim. Le tişte ku li dijî bawerî û dilovaniya min be an jî pe şerefa min bişke, ji te lava dikim ku tu ji min nexwazî. Te çeyiyek mezin bi min kir, ez deyndare ve çeyiya te me. Te çawa dest pe kir, wusa jî biqedîne. Bihele,  
119

ez û ve keçika sewî bidin ser we riya ku Xwede daye ber me û em biçin. Li kudere dibe bila bibe, û çi bi sere te were jî; ji bo xelasiya ruhe te î gunehkar, em e herdu jî banî Xwede bikin... Xweş diyar bû ku van gotinen min, mistek ava dilovaniye li ser dile Pûgaçev reşandi bû û loma:

- Baş e, bila fena te be! got. Dardekirin be dardekirin, bexişandin be bexişandin. Ev xwiyekî min e. Dergistiya xwe bide



pey xwe û te kudere dive bibe. Xwede bextiyariye bi para we ke!

Dûre vegeriya ser Şvabrûy û ferman daye ku ji min re kaxizek îcaze amade bike da ku ew navçe û kelen ku di bin femandariya wî de ne, ez te re bi serbesti derbas bibim. Te digot qeye Şvabrûy heliyaye û qediyaye edî. Wek kevirekî, hişk û beliv sekinî bû. Pûgaçev ji bo kontrola kele derket der, û Şvabrûy jî da pey wî. Le ji ber sedema ku ez e ji bo re xwe tev bikim, ez ji male derneketim.

Piştî ku ez bi tene mam, tavile bazdam oda Marya îvanovnaye. Derî ji paş ve hati bû qarosekirin. Min li deri da.

Denge Palaşkaye hat û:

-Ewkîye? got.

Min nave xwe got. Denge Marya îvanovnaye ji paş derî hat.

- Xwe hinekî ragiren, Pyotr Andreyîç. Ez kince xwe diguherim.

Hûn biçin mala Akûlîna Pamfflovnaye, ez e aniha werimwir.

Min bi ya we kir û ez ber bi hevşsa mala Gerasûn î metran çûm. Metran û jina xwe bi bezûy hatin peşiya min. Savelyîç berî min hati bû wir û hertişt kat kiri bû.

Akûlîna Pamfflovnaye:

- Hûn bi xer hatin, Pyotr Andreyîç. Sikir ji Xwede re, me dîsa hevdu dît. Hûn çawa ne? Her rojen Xwede hûn di bîra me de bûn. Le tew Marya îvanovnaye, ve rebena min ji ber tunebûna we gelek kişand! De ka bibe bence min, bi çi awayî we û Pûgaçev wusa li hev kir? Çawa bû ku wî hûn ne kuştin? Le dev je ber de, ji bo ve yeke jî mala wî ava...

Gerasîm î metran peyva we birî û got:

- Bes e, pîrejin. Dev ji ve zimandirejiye berde. Ê ji bîr meke ku tiye zimandirejan agire dojehe ye... Hûn li ser ser û çave min hatin Pyotr Andreyîç! Kerem kin tekevin hundur, ezbenî. Ji mej ve ye ku me hevdu ne dîtiye.

Jina metren çî xwarin û vexwarin hebû, ji hemûyî hanî û ji bo min li ser text danî. Di ve navbere de jî ziman le ne disekinî û her dipeyivî: Şvabrîn çawa cî li wan teng kiriye ku Marya îvanovnaye ji nav lepen wan deneme, çawa ku Marya îvanovna giryaye û ne xwestiye ji wan biqete, bi alîkariya jîriya Pa-laşkaye (ya ku kazake grûhban dixwest li ber bilûre bide reqisandin) çawa pewendiyan rojane di navbera xwe û Marya îvanovnaye de pet girtine, çawa li Marya îvanovnaye şîret kiriye ku ew ji min re name binivîse...hwd... ev hemû yek bi yek kat kir. Dema doba peyivîne hat min, ew tiştên ku di sere min de hati bûn, min jî bi kurtî kat kir. Çer ku metran û jina xwe bihîstin Pûgaçev pe dizane wan Pûgaçev xapandiye, dest bi gunehweşîne kirin.

Akûlûya Pamfflovnaye:

- Hz. îsa bi me re be! Ew me ji ve xezeba Xwede bisitirîne!

Le bi rastî jî ev Aleksey îvanîç Şvabrîna fisekek e!...

Di ve navbere de deri vebû û li ser ruyî xwe î vimirî bi pişirmek serîn Marya îvanovna kete hundur. Fîstane gundiyanji xwe kiri bû û wek bere dîsa xwe xweşikî tevpeça bû.

Min bi desten we girt, heta demeke direj jî beyî ku tu peyv ji deve min derkeve, ez rawestî mam. Ji bextiyariye dile me herduyan jî tije bû bû û bedengî daketi bû ser me. Xwediyen male xwe U wir zede his kirin û derketin der. Em bi tena sere

xwe man. Hemû tiştên ku qewumî bûn, me ji bîr kirin. Em peyvîn û her peyvûy. Em ji axaftine ter ne dibûn. Piştî ez ji kele veqetiya bûm, ew hemî tiştên ku heta naha hati bûn sere we, Marya îvanovnaye yek bi yek kat kir. Ew xeternakiyen ku jiya bû, ew tiştên ku Şvabrîne kambax hanî bû sere we, hemû hanî ber çave min. Me ew demen xwe yen bextiyar û derbasbûyî jî bi bîr hanyn... Em herdu jî di ser hev de girîyan. Dûre min fikra xwe ya li ser peşerojen me, je re vekir. Ev kela di desthilatiya Pûgaçev û femandariya Şvabrûy de bû. Li vir

121

mayîna we ne gengaz bû edî. Ê me nikari bû fikra mayîna li Orenbûrge jî bikira; lewra ev der bi xwe, bi eş û azara warekî dorgirtî bû. Li ruye dine tu merivekî we ne ma bû. Min peşniyar kir ku we bi xwe re bibim gund, ba de û bave xwe. Bere hinekî dudulî bû. Li ser zewaca me, we bediliya bave min ew tirsandi bû. Min tirsî we li ber belav kir. Lewra min dizani bû bave min e keça leşgerekî feris î ku ji bo welate xwe ketiye, wek serketina vatineyêke bihewîne.

Di dawîya dawîn de min got:

- Dildara min, Marya îvanovna! Ji naha ve wek ku tu jina min bî, ez li te dinerim. Ew bûyeren dûrî aqilan, em ewqas bi hevdu ve giredane ku li dare dine tu tişteke jî nikare me ji hev biqetîne.

Marya îvanovnaye ji dilûcan guhdariya min kir. Ne kete revvşen fediyokî, ne jî serî li xwe gerand ku nebe. We jî dizani bû ku nivisa eniya we bi ya min ve hatiye giredan. Le dîsa jî dubare kir ku beyî daxwaza de û bave min, ew e nikari be ji min re bibe jin. Ez jî li dijî ne sekinûn edî. Ji kela dil û daxwazek

germ me hevdu maç kir. Henveha di navbera me de her-  
tişt safî bû bû.

Piştî demeke şûnde, kazake grûhban kaxiza îcaza min hanî.  
Û bi min da zanîn ku desthilat banî min dike. Pûgaçev bi nivî-  
sa xwe ya xiluxwarî nave xwe li bine we nivisi bû. Dema ez  
çûm, wî jî ji bo reketine xwe amade kiri bû û li ser re bû.  
Wexta min xatir ji vî merive kambax - ji bili min ji bo herkesî  
xwînxwarekî mezin bû - xwest, ez nikarim pejnen dile xwe î  
we çaxe kat bikim. Le ez çî rûreşîye bikim! Di we gave de  
xwûya min gelek li wî dikeliya. Min pir dixwest ku ez wîji refe  
wî ye çapûlgeran veqetînim û hej ku wext heye sere wîji miri-  
ne bifuitmim. Le Şvabrîn û kesen li dora wî, ji min re asteng  
bûn ku min ev hemû tiştên di dile xwe de je re bi lev bikira.  
Bi dostanî me xatir ji hev xwest. Dema Pûgaçev di nava  
koma xelke de çav li Akûlîha Pamfflovnaye ket, bi tiliya xwe  
gef le xwar û bi mane çave xwe je re şikand. Dûre li taxûka  
xwe siwar bû, ferman da duruşkevan ku bajo günde Berdskaye.  
Bi reketina hespan re, wî di tiye xwe de, xwe xwar kir

122

û bi dengekî dîsa xatir ji min xwest:

- Bi xatire we, efendiye me! Hevîdar im em e dîsa hevdu  
bibinin.

Bi rastîjî me car din hevdu dît, le di kîjan revvşan de!..  
Pûgaçev çû. Dûr û direj min li we beyara sipî, li pey ra niherî.  
Taxûka wî wek baye bi dûr diket. Xelk belav bûn. Şva-  
brûy xwe havete dereke û ji ber çavan vvenda bû. Ez  
vegeriyam mala metran. Ji bo reketina me hertişt amade bû  
bû û min ne dixwest ez zede jî bisekinim. Hemû tiştên me di

kevnetaxûka femandariye de hati bû tikirin. Hespina bi destsivikî pe ve hati bûn giredan. Ji bo ku ve cara daran xatir ji gorna de û bave xwe bixwaze, Marya îvanovna çû paş dere. Min xwest ez jî pe re biçim, le ji min lava kir ku ez we bi tene binelim. Piştî çend deqan vegeriya û hat. Bedeng û bi çaven tije hesir bû. Taxûka me kişiya bû ber derî. Gerasûn î metran û jina xwe derketin ser pelikan ku me bi re bikin.

Ez, Marya îvanovna û Palaşkaye, me di taxûke de tiye xwe girt. Savelyîç derket li tiye duruşkevan rûnişt.

Akûlîna Pamfflovnaya dilpakgot:

- Bi xer û xweşî biçe kevoka min, Marya îvanovna! Riya te vekirî be sere min, Pyotr Andreyîç! Xwede bi we re be, Xwede we herduyan jî bisitirîne.

Em bi re ketin. Di pencera mala femandar de Şvabrîn ber bi çave min ket, kerb û xirabî ji ruye ra dibarî. Min bere xwe bi helek din de kir. Lewra min ne xwest ku ez li sere neyarekî nîvkujî meraniye bikim. Taxûka me ji dere kele derket, me kela Belogorske heta û heta li cî hişt.

123

-XIIIZÎNDANÎTÎ

- Hirs nebin ezbenî, fermanberek im

Divi ez tavili bavejim hundur vve.

- Fermoji vve re, ez amade me

Le beri bide min destûri ku xwe bipolarizim.

«Knyajnîn»

Ev hemû tiştên ku bûn, bi min wek xewneke dihatin. Levvra ez û ve xweşika ber dilan, em bi rewşek nepayî güüşti bûn hev. Hej ve sibe jî di ber rewşa we de bi eş ez diqirqilîm. Ma-

rya îvanovna ji min betir krar difýkirî, bi xemgûyî gav li min û gav li re dinerî. Xweş diyar bû kû hej ne hati bû ser xwe. Em herdu jî bedeng bûn. Me hertişt hani bû ber çaven xwe û dil li me vvestiyayî bû. Beyi ku em bizani bin be wext çawa derbas bû, piştî du saetan me nezflcî li kelake kir ku ew jî di bine desthilatiya Pûgaçev de bû. Li vir hesp hatin guhertin. Femandare keke kazakekî bi rî bû. Li dorhela me wek penvane li ba diket û ev kare guhertina hespan di dest de kir. Ji viya jî tegehiştim ku duruşkevane me î zimandirej, ez wek neziktirîn merive Pûgaçev dame naskirin.

Em dîsa ketin re. Tariye dest pe kiri bû xwe dadigirt ruye erde. Me nezflcî li bajarekî piçûk dikir. Li gor saloxdana kazake bi rî, hezeke xurt li vir civiya bû ku tekeve nav heza Pûgaçev. Nîgehbanen şeve peşî li me girtin:

- Di taxûke de kî heye?

Duruşkevan ev pirsî bi dengekî bilind bersivand û got:

- Hevale Çar e. Xatûna w jî pe re ye.

124

Nîgehbanen şeve tavile dor li me girtin û dijûne gelek xirab li me barandyn.

Sergrûhbanekî bi simbel ji min re:

- Derkeve der, hevale şeyten! got. Naha tu û xatûna xwe, hûn e herdu jî ser û bine erde bibinin!

Ez ji taxûke daketim û min ji wan daxwaz kir ku min bibin ba femandare xwe. Dema leşgeran li peş xwe çav li efserekî xistin, dev ji dijûnan berdand. Sergrûhban bi racemî min ket ku min bibe peş serheng. Savelyîç li pey min dimeşiya, dihat û xwe bi xwe digot:

- Aji te re hevale Çar! Em hatin heyfa bave, me ewkâ de jî da ser... Xwedeyo! Va rewşa me e li kudere bisekine?

Taxûk jî hedî hedî li pey me dihat.

Piştî penc deqan em hatin ber xaniyekê piçûk ê rohnîk. Sergrûhban li wir nîgehbanek da ber min û bi xwe jî çû hundur ku hanyna min ji jor re bibeje. Ket hundur û tavile derket. Ê bi min da zanîn ku fermender ferman daye û gotiye: Naha wexta min tüne ez banê bikim, wê bavejin zîndane û xatûna ra jî bine ba min.

Ez bi hers qeriyam û min got:

- Ev çi ye? Ma ev meriva xerifîye, çi ye!

Sergrûhban bersivand û got:

- Ez nizanim, ezbenê. Le fermendar efendî ferman rakir ku em efendiye xwe bavejin zîndane û xatûna ra jî bibin ba fermendar efendî!

Min ber bi pelikan lezand. Nîgehbanan ne kirin ku nehelin ez biçim. Rasterast ez ketim hundure odeyeke. Li vir şeş efseren koma parezgerî rûniştî bûn û bi qeremaçan diliştin. Serheng deste qeremaçan belav dikir. Çer ku min çav li ra xist, di cî de mitûmat mam. Min tavile nasî ku ew îvan îvanovîç Zûrîn e. Wexteke li xana Simbîrske di lîstika bîlardoye de sed rûbil ji min xwari bû.

Ez qeriyam û min got:

- Wey, gelo ez çewt nabûyim? îvan îvanovîç? Ev tu î, ne wusa?

- Wey, wey, wey! Pyotr Andreyîç! Tu û van derina? Tu ji

125

kudere tey? Bi xer hati birake min. Ma tu jî naxwazî beşdarî

listikamebî?

- Na, gelek sipas. Le ku tu fermane bidî û ji bo min tavile xaniyekî peyda bikî, ew e gelek baştir bibe.

- Ma tu xenî çi dikî? Li ba min bimîne.

- Na, nabe, Ez ne bi tena sere xwe me.

- Baş e, we çaxe hevale xwe jî bi xwe re bûye.

- Ne heval e ew... ew keçikek berzewac e...

- Errr... rik! Keçikek! Ka bibeje, te ji kudere bi dest xist?

Û Zûrin bi ve peyvika xwe re bi awakî raýsa manedar fîkand ku ew hemû kesen di ode de bi biqîn kenyan, û ez jî gelekî şermesar ketim. Zûrîn peyvenxwe domand û got:

- Baş e, bila fena te be. Ku xanî be, em e tavile xaniyekî ji te re peyda bikin. Le bi rastî jî gelek heyf e... Me e dîsa fena bere kefxweşiyek li dar bbrista... Ca binere, ero leşger! Ew dergistiya Pûgaçev çûna naye? Serhişkiye dike, çi ye? Je re bibejin, bila tew netirse. Xortekî li hev hatiye û tişteki xirab nake, bibejin. Û dûre bi porçika we bigiren, we çaxe ew e bi xwe were.

Mmji Zûrîn re got:

- Ev çi bû veka? Kî dergistiya Pûgaçev e? Ew keça kapîtan Mîronove rihmetî ye. Min ew ji nav lepe çapûlgeran fîlitandiye, aniha jî ez e we bibim günde me û li rar binelim.

- Tu çi dibejî? Na xwe ew kesen ku bi qasekî bere qal dikirin, tu bûy? Xwedeyo! Baş e, ev çi ye?

- Ez e dûre hertiştî ji te re bibejim. Le tu naha rabe û ji bo Xwede dile we keçika reben xweş bike. Leşgeren te ew tirsand. Zûrîn tavile leşgeren xwe haydar kirin. Ji ber ve xeletiya ku çewt hati bû tegehiştin, bi xwe jî rabû çû derve ku ji Marya



Îvanovnaye bexîşandîna xwe bixwaze. Ferman da sergrûhban ku ji bo we, li bajar maleke heri baştir bete peydakirin. Min e jîşeva xwe li ba Zûrîn bibuhuranda.

Bi hemî efseran re me şîva xwe xwar û piştî şîve ez û Zûrîn bi tene man. Ew hemû bûyeren ku di sere min de hati bûn, yek bi yek min je re kat kir. Zûrîn ji dil guhdariya min kir.

126

Piştî ku min qedand, sere xwe hejand û got:

- Hemû baş e û xweş e, le ez tiştêkî tenagehijim ku tu li pey kîjan şeytanî diçî û dizeraçî. Tişte ku ez rast dibinim, wek efserekî şerefmend dive ez ji te re bibejim. Bawer bike ku zewucîn, dînitî ye. Ma tu e cima tekevî sereşîya jin û zarokan?

Dev je berde! Binere ez çî dibem: Tu were dev ji ve keça kapîtan berde! Min riya Sîmbîrske ji neyaran paqij kiriye. û be xeter e. Sibe we bi tene bişîne, bila biçe ba de û bave te. û tu jî li vir, li ba min, di heza parezgeriya min de bimîne. Tew ne hewce ye ku tu vegeerî Orenbûrge jî. Ku tu dîsa tekevî nav lepen serhildaran, xelasiya te e tunebe. Ca bila binek wext tekeve navbere, tu e bi xwe jî bibini be çawa ew agire evîhdariye li te bibuhure, û hertişt e ji nû ve baş bibe.

Ez ne di ve baweriya ra de bûm. Le min dizani bû ku di nava ordiyen Çariçeye de mayûy û şerkirin jî, deynekî hustuye min e. Min biryara xwe da ku ez bi ya Zûrîn bikim; Marya Îvanovnaye bişînim günde me û ez bi xwe jî li vir di heza parezgeriya ra de bimînim.

Savelyîç hat ku alfcariya denristina kincen min bike. Di ve navbere de min pe da zanîn ku biçe xwe tev gire bide, sibetire ew û Marya Îvanovnaye bi tene tekevin re û biçin.

Tavile dest bi serhişkiya xwe kir û got:

- Ev çi ye, Pyotr Andreyîç? Ma ez e çawa te bi tene bine-  
lim? De û bave te e çi bibejin?

Min ji bere de xwiye pîremer dizani bû. Ji ber ve yeke jî  
min kir ku bi zarekî xweş ez ra bînim ser re. Min dest pe kir û  
got:

- Hevale min î Arhîp Savelyîç! Nebeje na û ve çeyiya xwe ji  
min re nede paş. Li vir tu hewceyîya min ji xulaman nîne. Ku  
ez Marya îvanovnaye jî bi tena sere we bişînim û tu ne pe re  
bî, husûyâ min e her di ser we de xwar be. Xulamîya ku ji we  
re bikî, mîna ku te ji min re kiri be. Lewra çer ku daraya van  
tevlîheviyan were, ez e bi we re bizewucim.

Bi bihîstina van gotinan re Savelyîç bi matmayîyek mezin  
desten xwe li hev dan û got:

- Bizeraýcî, ere! Zaroke doýîn dixwaze bizeraýce! Le bave  
127

te e çi bibeje, diya te e çi bifikire?

Min bersivand û got:

- Ew e bihewûyîn. Piştî bizani bin ku Marya îvanovna kî ye,  
dive bipejirinin. Min jî heviya xwe sipartîye te. De û bave min  
bi te bawer in, Savelyîç. Tu e jî navbera me xweş bikî edî, ne  
wusa?

Ev peyven min keti bûn sere pîremer û loma got:

- Ax, Pyotr Andreyîç, roniya herdu çave min. Gerçî ji bo  
zewaca te, wext hej pir zû ye. Le Marya îvanovna jî keçek  
wusa ye ku, bi rastî jî ew e gelek heyf be ku meriv ve fesale ji  
dest xwe denrine. Baş e, bila mîna te be! Ez e ve hûriya Xwede  
bi xwe re bibim, ji pîvana xwe der ez e ji de û bave te jî

lava bikim ku be zîv û zeren bûkaniye be jî, hejayî bûka malan e.

Min sipasî Savelyîç kir û ez çûm oda ku lihefen min û Zûrîn te de. Ez û Zûrîn li ser lihefen xwe ramediyar û em peyivîn. Ji kefxweşî çî dihate ber deve min û min digot. Zûrîn jî bere dikvvaze galeaglan bû. Le hedî hedî peyvik di deve wî de giran û direj bûn û di daraya daran de li ser pirsêka min beyî pbrine deng je ne hat. Bi qasekî deng ji min hat birîn û dûre min jî da ser sopa wî.

Sibetire zû, ez çûm ba Marya îvanovnaye. Min biryara xwe je re got û we jî ev tişt baqilane dît û pejirand. Di we roje de heza parezgeriya Zûrîn ji bajar diqetiyar. Wexta me teng bû û diviya bû me jî lez bikira. Min Marya îvanovna siparte serûsiwa Savelyîç, ji bo de û bave xwe min nameyek jî da we û li wir, li ser lîngan me xatir ji hev xwest.

Marya îvanovnaye bi girî û hedfîca:

- Bi xatire vve, Pyotr Andreyîç! got. Xwede dizane be em e car din hevdu bibinin an ne. Le ez e li dare dine qet vve ji bîr nekim. Heta mirine hûn e her di dile min de bin.

Min tu peyvek din ne kir. Li dor me gelek meriv hebûn.

Min ne dixwest ku ez pejnên diltenikiya xwe li peş vvan, li xwe bidim der. Piştî ku taxûka we bi re ket, ez jî bedeng û xemgîn vegeyriyam ba Zûrîn. Hevale min kir ku kefa min xweş bike.

Bi rastî min jî dixwest ez hinekî li xwe vebim. Henveha vve

128

roje heta evare, me gevzûşadî kir. Ê bi evare re jî em derketin cevle.

Ev di rojen daraya meha çele paşûy de bû. Ew zivistana ku

li peş bicîhanîna operasyonen leşgerî bû bû asteng, diqediya edî. Û generalen me yen din jî, ji bo alîkariya me dest didan hev û xwe amade dikirin.

Pûgaçev hej li dor Orenbûrge bû. Li gel ve yeke jî her ku diçû, komiken leşgeren me dor li çapûlgeran digirtin û cî li vvan teng dibû. Günden serhildaran çer ku çav li hezen me diketin, guhen vvan di ber de dadiket, li her devere komiken çapûlgeran ji ber me direviyan, û hertiştî dida xuyakirin ku serketin û şerfirazî gelek nezflc e.

Pû- ne buhurî Prens Golîtsûy li dor kela Tatişçev ci li Pûgaçev teng kir, heza vvi belav kir û Orenbûrg ji dest xelas kir. Henveha ve herişe jî beguman dabû xuyakirin ku evv e şer bi çiaawayîbiqede.

Dema ku hezen leşgerî li navçeyan hatin belavkirin, evv e Zûrîn jî bi heza xwe li hemberî komikek başkirdan şer bikira. Le beriya ku em û vvan li hev rast vverin, merikan xwe belav kirin jî. Li gundekî tataran buhar bi ser me de hat. Li hemû nevalan laser rabû û re li me hatin girtin. Li ber ve yeke dest û ling li me hati bûn giredan û xemginiye bi me girti bû. Le dema em difikirîh ku ev sere berûmet î bi diz û çapûlgeran re li xelasiye ye, vve çaxe hinekî behn dihat ber me.

Le hej Pûgaçev destgîr ne bû bû. Ji nişka ve li navçe hetûnen Sîbîryaye dîsa deng da, komiken nû ü dor xwe civand û dîsa dest bi çapûlgeriye kir. Serketinen vvi dîsa di nava xelke de hatin gotin û belav bûn. Me dibîhist ku kelen Sîbîryaye yek bi yek ketine. Piştî demeke kurt nûçeyek gihîşt me ku Çare derevvîn bajare Kazane girtiye û naha jî dajot ser Moskvaye. Ve nûçeye tirsek xisti bû dile vvan hemû navmezinen leşgerî,

yen ku heta naha xwe bi bavveriya beheziya Pûgaçev dbcapandin.  
Zûrûy ferman hilda ku ji Volgayâ derbasê hela hundur  
bibe û herişen xwe li vvir bike.

Li vir ez e dûr û dirâj H ser şer û herişen me ne sekinim. Le  
bi gotinek kurt ez dikarim bibejim ku; tunebûnek dijjvar xwe  
129

dabû qirika me. Evv hemû günden ku serhildaran serûbinê  
hev kiri bûn, ve çare jî em le dikelin û ji beçarî çî tiştên ku di  
nav lepen gundiyan reben de ma bûn, me dbcvvar. Li vvelet ne  
re û rebaz û ne jî garantiya jiyana merivan ma bû. Mîren xwedî  
erd û eşîran, xwe di nava daristanan de diveşartin. Çapûl-  
geran her dever di erde re dikirin û dile femandare komiken  
vvan çî bbcvvesta evv dikirin. Ser û bine vvelet bi reviya agire  
vvan dişevvutî... Le me hevî ji Xwede heye ku gele ûris ji serhildanen  
vvusa dijjvar bipareze û carek dm jî nede jiyandin!

Pûgaçev qul bi quldireviya û îvan îvanovîç Mflýelson jî  
dabû pey ra. Gelek ne buhurî, hat gotin ku Pûgaçev şikestek  
mezin xwariye. Dûre Zûrîn jî birûskek vvergirt ku Pûgaçev  
hatiye girtin û şer sekiniye. Şer ravvestiya bû. Henveha min e  
bikari buya li mala de û bave xwe vejeriyama. Her ku ez difikirîm  
û min xwe H ber hemeza vvan didît, kefxweşiye cî ne  
dida min. Hevdîtina min û Marya îvanovna - ku ji zû de min  
hay ji revvşa vve tunebû - diket bîra min, bi dilşadiya zarokekî  
ne ditebitûn ez. Zûrûy bi ve revvşa min dikeniya, lev li xwe  
diqermişand

û digot:

- Na, birako! Peşerojen te ne bi xer e! Zevvac, ere? Heyf e  
ku tu sere xwe î be eş, girişan le dipeçî!

Le di ve navbere de ramanek vvusa xerîb kete hişe min ku kefxweşî U min bû jahr. Ev seroke çapûlgeran î ku keti bû ber xwîna ewqas meriven reben, û evv arihandina ku li bende vvî bû... Her ku ez difikirîm kizînî bi kezeba min diket. Bi dilekî xemgûy û xwe bi xwe min digot: «Yemelyan, Yemelyan! Te cima xwe ne havet ber deve şûrekî, an tu cima rastî perçekî gulûla topekî ne hatî? Ma ne çetir bû ji te re?» Le min e çavva ji bû- bikira ku; vvî di wextek dijvvarîna jiyana min de ez bexişandim

û dergistiya min ji nava lepe Şvabrîne dilverişûy xelaskir. Min destura xwe ji Zûrûy girt. Piştî çend rojan ez e dîsa li vvare de û bave xwe bûyama û min e dîsa Marya îvanovna xwe ya xweşik bidîta... Le ji nişka ve boblatek nepayî li ber lingen min rabû.

Roja ku ez li ser re bûm û ez e edî biçûyama, kaxizek di 130

dest Zûrûy de û hat malika min. Gelekî bi şik dbcuya. Tiştekan niquî dile min. Tirseke girt ser min beyî ku ez bizani bim be cima. Zûrûy fermanbere min şand derve û bi min da zanîn ku karekî vvî bi min heye.

Min jî bi şik pirsî û got:

-Çiye?

Kaxiza di deste xwe de direjî min kir û:

- Xeberek bexer e, got. Ji te re tu bi xwe bbcvîne, bi qasekî berî ket deste min.

Min kaxiz gû-t û xwend. Ev fermanek bi dizî bû. Ji hemû femandaren ordiyan re hati bû şandin ku li kudere min bibi- nin, bi nîgehbanîyek xurt dive min bişînin Kazane, peş dadpirsiya

lekolîneren serhildana Pûgaçev.

Pû- nema bû ku kaxiz ji dest min de biketa.

Zûrûy:

-Tişte ku ji bo ve bete kirin, nîne! Vatiniya min dive ku ez fermane bi cî bînim. Wusa xuyaye gotinen hevaltiya te û Pûgaçev gihîştîye jor. Ez hevîdar ûn ku xirab tevnegere û lekolîneren dadpirsiye te tavvanbar dernexûy. Tevv behna xwe teng neke. û tavile tekeve re!

Dile min pak bû. Ez ji dadpirsiye ne ditirsiyam. Le dema ez li ser şûndeketina hevdîtina me ya germin difikirûn, - kî dizane, dibû ku bi mehan bajota edî - ji kerba ez dîn dibûm. taxûk amade bû. Zûrîn bi dostî xatir ji min xwest. Li taxûke sivvar bûm. Bi sûre xwe yen tazî, du balbas li keleka min rûnişti bûn. Ê em ketin riya Kazane.

131

-xrv-

DADPIRS!

Çipilin ava deryayi

Çipeyvin devixelki

«Metelok»

Ez bi xwe evvle bûm ku tavvanbariyek min tuneye. Tene ez be destur ji Orenbûrge dûrketi bûm. Ev yeka jî ne dijvvar bû ku min xwe li ber biparasta. Levvra sivvariya li dor û dûre kele ne qedexe bû. Henveha bi herhavvayî dihate pejirandin jî. Ku güilye min bihata kirin jî, ji ber xwîhgermiya min bû; ne ji ber serhişkiya min. Gelek tiştên ku pevvendiyen hevaltiya min û Pûgaçev bipeyitanda hebûn û bi rastî ya xirab jî ev bû. Di re de pirsên ku evv e ji min bihata kirin, min hemû di sere xwe

de bi cî dikirin û li bersiven vvan digeriyam. Min biryara xwe da ku ez di dadgehe de hertiştî rasterast bibejim. Levvra min ev avvaye parastina xwe, avvayekîberçavtir û evvletir didît. Dema em hatin Kazane, min nehirî ku bajar vikûvala û şeraýtîye. Li kuçan û devvsa xaniyan keşen rijike şevvate dixuye, dîvvaren be ban û pencerena ji dû û dûkele levvûtûye. Pûgaçev riya xwe bi vir jî xisti bû û şopek vveha li dû xwe hişti bû. Di nava zike vî bajare hilvveşiyayî de, avahiya ku tene li ser lingan ma bû, kela bû. Balbasan ez hajotim ber keke û li vvir ez dam dest efserekî nîgehban. Wîjî tavile hesingerek da bankirin, lingen min h qeyde xistin û ez hişkfirî pe ve mam. Dûre vvan ez birim bendûcane û havetim paş deriye selûlek teng û

132  
tarî, dîvvaren vve rût û ji beçikân hesinî pencerekek piçûk... Daraya ve destpeke xerab dbcuya. Le dîsa jî ne tirs ket dile min û ne jî min heviya xwe birî. Min xwe havet bexte xemreviya hemû kesen xemgîn, û ji dile xwe î dilovan û birîhdar min banî Xwede kir. Henveha evv tişte ku evv e di sere min de bi-hata min havete heleke, min betirs xwe direj kir û ez ketim xeweke giran.

Sibetire dergevane bendöcane ez ji xew rakirim,. û bi min da zanîn ku komisyona banî min kiriye. Du leşgeran ez dam ber xwe û di hevşe re em derbasî ber mala fermander bûn. Leşger di deve derî de sekinin û ez berdîm ku bi tena sere xwe biçim hundur.

Ez ketim hundure eyvvanek gelek mezin. Li ser maseke tije kaxiz û li paş vve jî du meriv rûnişti bûn. Ji van yek generalekî pîr î bi ruyekî hişk û sar bû. Ye din jî kapîtanekî heza parezger



bû; lihevhatî û li dor bîst û heşt salî bû. Merivekî destbiker  
û di tevgeren xwe de serbest dixuya. Li keleka pencere,  
li ber masekak din jî nivismend rûnişti bû. Qelema xwe di paş  
guhe xwe re kiri bû, bi avvayekî amadekar xwe di ser kaxizan  
de xwar ldrî bû ku tişte nûn e bigota, vvî e jî bi kurtî büüvisiya.  
Dadpirsiye dest pe kü-. Nav û malbata nûn ji nûn hat pir-  
sin. Generel xwest ku ji min jî bibihîse ka ez lavve Andrey Pe-  
troviç Grînyov im, an ne. Min bersiv da. Li ser vî yeke, bi hers  
di ser nûn de qerîya û got:

- Çiqas heyf e ku bavekî vvusa giranbiha, xwedîlawekî vveha  
be xer be!

Bi behnek fere nûn bersivand û pe da zanîn ku; güiye ku li  
ser min hatiye ldrin çi dibe bila bibe, nûn hevî heye ku ez rastiye  
ji dil kat bikim û ji ve yeke xelas bûn. Ev bavveriya min ya  
bi min, li peşka generel ne hati bû. Ê bi nûrûzekî tirş:

- Reng e ku tu yekî deqdor i, xorto! got. Le me kesen ji te  
deqdortir jî dîtine.

We çaxe dadpirse xort ji nûn pirsî ku; kengî û çavva ez keti-  
me xizmeta fermana Pûgaçev û nûn kîjan vatiniyen vvî bi cî  
hanine.

Bi hers nûn bersivand ku vvek malmezin û efserekî, ez qet

133

ne ketime xizmeta fermana Pûgaçev û nûn tu vatiniyen vvî jî  
bi cî ne hanine.

Dadpirs ü dij derket û got:

- Dema hemû hevalen vî merivî malmezin û efserî, bi avvakî  
barbarîbi deste Pûgaçev bete kuştin; çavva dibe ku tene evv te  
bexişandin? Çavva dibe ku dîsa ev malmezin û ev efsera beşdarî

gevvzûşadiyen serhildaran dibe, xelaten vvek kürk, hesp û pençe kapikî ji seroke çapûlgeran vverdigire? Ev hevaltiya vvusa seyr ji çi te? Ku ne bebextî be, an jî bi kemani ku ev ne tirsonekiya beşerefiye be, le çi ye ev ?

Ev gotinen kapîtane heza parezger, şerefa nûn gelek şikand. Min bi hers dest bi parastina xwe kir. Li beyare di bin dijvvariya pûke de destpeka hevnasiya nûn û Pûgaçev çavva bûye; di ketina kela Belogorske de vvî çavva ez nas kirime û beşişandime; min kat kir û pe da zanîn ku ji çapûlger jî kürk û hesp girtina nûn ne tişteki xelet e, û heta naha jî li dijî çapûlger min ji dilûcan kela Belogorske parastiye. Di daraya daran de jî nûn nave general daye ku di ketina Orenbûrge de evv e bikari be dîdevaniya fedekariya min bike.

Pîremerî bi mirûze tirş, ji ser mase namekek vekirî girt û bi dengê bilind dest bi xwendine kir:

«Li ser daxwaza Ekselanse vve: Ez xwe pi serbilind dibinim ku vve ji Grînyov i sutvan haydar bikim. Li gor saloxdani di serhildana roja îroyîn de tiliya Grînyov heye. Li dij vatiniya sermilixwe û sonda xwe ya leşgerî, ketiye nav pivvendiyin rûreş. Û ev sutvani ku ti gotin, ji seri celi payiza sala par (1773) heta 24 zivistana paşîna îsalîn, li Orenbûrgi li ser vatiniya xwe bû. Liji vi roji ûpi veji bajar veqetiya û bi şûnde venegeriya û ne hat idî. Li gor saloxdanin ku ji hila neyaran reviyane û hafine; evv çûye parizgeha Pûgaçev ba vvî, û dûrejî herdu bi hev re çûne kela Belogorska ku vvî beri vatiniya xwe li dikir. Di vware revvşa tevgera vvî de, ez dikarim...»

Dadpîrs li vir xwendina xwe biri û hişka got:

- De ka tu e naha xwe çavva biparezî?

Min xwest ku min çavva dest pe kiriye, vvusa jî bidomûüm û pevvendiye xwe û Marya îvanovnayê vvek hemû tiştên din ve-  
134

kirî bi lev bikim. Le ji nişka ve dilverîşiyek kambax li min rabû. Ez fýkirîm ku ez nave vve bidim, komisyon e vve bide bankirin û guhdariya vve jî bike. We çaxe evv e nave vve i paqîj jî tekeve nava gilî û gazinen qirej. Û henveha vvan e Marya îvanovna û evv kesen kambax bihaniyana ber hev. Ve ramana xirab sere nûn vvusa tevlihev kir ku ziman H nûn hat giredan û nûn nizani bû ka ez çi bibejim.

Dadpirsen ku dest pe kû-i bûn bi avvakî dilovanî guhdariya min dikirin, piştî ditin ziman li nûn nagere, vvek bere li hemberî nûn dîsa ketin revvşen xwe yen hişk. Kapîtane heza parezger xwest ku nûn û sûcur bînin ber hev. Genel ferman da ku vvî çapûlgere do bûn. Bi dikvvazî H derî vegeyriyam û min pa ku ez vvî kesî ku sûcuriya nûn kiriye, bibînim. Piştî gaveke şingina denge resilehat, derî vebû û Şvabrûy kete hundur. Çiqas guherîbû! Ez behitî mam. Gelek û gelek jar bû bû û gvvîn le bû bû gvvîne miriyan. Pore vvî ye ku bi demekî beriya naha ripûreş, bi tevayî sipî bû bû. Riye vvî î direj tevlihev bû bû. Bi dengekî nizm, le bi avvakî evvle evv giliyen xwe duçar kir. Li gor giliyen vvî; Pûgaçev ez vvek sîxurekî şandime Orenbûrge. Dema ku li hemberî serhildaran şer çebûye, ji bo ku Pûgaçev ji bajar haydar bikim, ez jî her roj bi hespe derketime gere. Û di daraya davvîn de jî, rasterast çûme ba seroke çapûlgeran û ez bi vvî re kela bi kela geriyame. Ji bo ku hevalen min ji hela Pûgaçev ve nebin xwedîparen xelatan û ji bo ku ez xwe di çav vvî de şerîntir bikim, nûn bebextî li hevalen xwe kiriye...

Ev peyvana nûn bedeng guhdar lor. Ez ji tişteki kefxweş  
bûm ku xwînxwar nave Marya îvanovnaye bi lev ne kiri bû.  
Gelo cima ne goti bû? Aya ne dbcvvest bi bû- bîne ku; keçike  
peşniyara vvî nayandi bû û evv jî li ber xwe keti bû loma; an jî  
evv pejnen ku di vî vvarî de ez bedeng didam sekinandin, hej  
di dile vvî de jî hebû loma?

Ji ber çî dibe bila bibe, nave keça femandare kela Belo-  
gorske li ber komisyona dadpirsiye ne hati bû gotin. Henveha  
li ser biryara xwe ez evvletir bûm ku nave Marya îvanovnaye  
neynim ser zimane xwe. Dema dadpirsan gotinen min, yen li  
ser güiye Şvabrîn pirsîn; nûn bersivand û got: nûn tu gotin  
135

nîne ku ez li gotinen xwe yen bere zede bikim.

Generel ferman da ku me herduya jîji hundur denrin. Em  
bi hev re ji eyvane derketin. Min vveha li ruye Şvabrîn nehirî,  
le min tevv denge xwe ne kir. Bi livek tolebar pişirî, resilen  
xwe dan hev, ket peşiya nûn, bi lez meşiya û çû. Wan dîsa ez  
havetime paş dere zîndane û carek din jî ez banî dadpirsiye  
ne kirim.

Evv bûyeren ku ez e ji vir û pe ve ji xwendevan re kat bi-  
kim, nûn tu yek jî bi çaven xwe ne dîtine. Lâ nûn çîroken vvan  
ewqas pir guhdar kirin ku hemû jî di ser û ber ve di hişe nûn  
de bi cî bîne. Di cî de ye ku ez bibejim; min ev bûyeren ha bi  
çav ne dîtine le ez vvan jiyam.

De û bave nûn vvek meriven sedsala bere, bi rûkeniyek jidil  
Marya îvanovna hevvandi bûn. Hevvandina sevvieke, ji bo  
vvan bextiyariyek mezintirîn bû. Piştî demeke, xwîna vvan baş  
li Marya îvanovnaye keliya bû. Levvra dûrî aqilan bû ku piste

nasîna Marya îvanovnaye merivan je hez ne kira. Evîndariya nûn, li cem bave min edî ne serserîtiya xortaniye bû. Daxwaza dile diya min jî, tene ev bû ku lavve vve î xoşevîst bi xweşik a keça kapîtan re bizevvue.

Dema ku bihîsti bûn ez hatime girtin, di male de sere herkesi tevlihev bû bû. Marya îvanovnaye pevvendiye di navbera nûn û Pûgaçev de, ji vvan re bi zarekî vvusa vekirî kat kiri bû ku evv qet pe nerihet ne bû bûn, tevv carina bi bû-hani bûn û ji xwe re kiri bûn vvek mijarek pekeniye.

Bave min ne xwesti bû bavver bike ku ez jî beşdarî serhildanek vvusa bubim ku li ser çîna malmezinan desthilatiye bike.

Le dîsa jî cî li Savelyîç teng kiri bû. Lalaye min jî be veşartûyê je re goti bû; efendiye piçûk bû bû mevane Yemelyan Pûgaçev û vî sereke çapûlgeran jî rûmeta vvî dizani bû. Di vvare caşitiya min de jî sonden nemaye xwari bû ku tişteki vvusa ne bihîstiye.

Bi ve yeke behna salmezinan lûnekî fere bû bû û be tevvatî li bende xeberen xere bûn. Marya îvanovna gelek eşiya bû le peyv ji deve vve derneketi bû. Levvra evv merivek gelek nevspiçûk û tegüüştiya ve yeke bû.

136

Çend hefte derbas bûn. Rojêke ji nişka ve nama merive me î Prens B. ji Petersbûrge ji bave nûn re hat. Prens, di nama xwe de dîr û direj je re qala min kiri bû. Di peyv du se peyvên xwe yen rojaneyî re dîsa vegeriya bû ser vvan şiken li ser nûn û pe dabû zanîn ku; evv şiken li ser nûn, mbcabin rast derketi bûn, ez beşdarî serhildaran bû bûm, bi rastî diviya bû ez bi tavvana mirine bihatama arihandine. Le ji ber giramiya rîspîtiya

bave nûn û vatiniya ku kiri bû, Çariçeye ez ji rûreşiya tavvana nûrine xelas kiri bûm û ji dela ve ve, ez li quncikekê Sîbîryaye bi tavvana jiyane hati bûm arihandin.

Ji ve xebera nepayî, dikira bave min tetincanî biba. Wek bere nikari bû li ber xwe bida edî. Evv xemgûüya xwe ya ku heta îfo di xwe de bedeng vedişart, aniha bi dilşevvatî li xwe dida der û her behiş digot:

- Ma ev jî dibe? Lavve min jî bide ser riya Pûgaçev! Xwede, ma çaven sere min e ev rojana jî bidîta? Çariçe vvî ji nûrine dibexişîne!.. Ma bexişa vvî dikare bibe xemreviya ber dile nûn! Ma tavvana nûrine xirab e! Kalike kale min, ji bo doza xwe ya pîrozver, heta çilka xwîna xwe ya davvûy jî şer kir û di dara sepe de li ba bû. Bave min tev Volînskî û Krûşçev bi mirinek eşdar çûn. Ya xirab ev e; ku malmezinek rabe li ser sonda xwe bebextiye bike û biçê tekeve nav refen çapûlger, xwîhrej û xulamen ji zindanan raykirdî. Ev ji bo malbata me rûreşiyek mezin e!

Ji ve behevitiya bave min tirs diket dile diya nûn, hesren çaven xwe je vedişart û ji bo ku xemgûüya vvî li ber belav bike, her je re digot; deve xelke doxîna meriv nine, kî çi dibe bila bibeje, bavverî bi gotinen vvan nabe. Le bave nûn xemrevî ne dibû.

Kul û kesera dile Marya îvanovnaye ji ye hemûyan jî betir bû. We be şik dizani bû ku nûn bbcvvesta, min e bikari buya begunehiya xwe peşan bida. Rastiya ve nexwestina nûn jî tedigehişt û henveha sedema ve bextreşiya nûn, xwe didît. Le hesren çaven xwe û kul û kesera dile xwe ji herkesi vedişart û her difikirî ku bikari be, bi çi avvayî min xelas bike.

Sere evarekî, bave nûn dîsa li şer dîvanca xwe rûnişti bû,  
137

rûpelen saldeftera qesre li hev diquliband. Le diyar bû ku hişê vî ji saldeftere dûr, li devereke din bû. Xwendine bi qasî hertim bala vî ne dikeşand. Di ber xwe de dest bi fikîna marşek kevn kiri bû. Diya min bedeng li quncikekî rûnişti bû, fanolîyekî hirî çedikir û carina jî dilopen hesiren çaven vve di ser de diçilkiyan. Marya îvanovna jî li vvir rûnişti bû, di dest xwe de tiştêk dihûna. Ji nişka ve kare di dest xwe de danî û pevvistiya çûyîna xwe ya Petersbûrge bi vvan da zanîn û alîkariya birekirina xwe ji vvan daxwaz kir.

Ji ber ve yeke xemgûyêk mezin bi diya min girti bû û got:

- Tu e ji bo çi biçî Petersbûrge? An te dil heye tu jî me bi tene bihelî, Marya îvanovna?

Marya îvanovnaye pe da zanîn ku hemî bextiyariya vve ya rojen peş li ser ve çûyine ye, vvek keça merivekî ku li ser doza xwe hatiye kuştin, vve e biçûya xwe baveta bexte alîkariya meriven mezin.

Bave nûn sere xwe xist ber xwe. Her peyva ku tavvanbariya kûre vî dihanî bîra vî, vvek tinazek giran pe dihat.

Ji kvîr de keserek veda û got:

- Biçe daka nûn. Em naxwazin peşîye U bextiyariya te bibirin. Hevîdar ûn tu e ji xwe re merekî dilpak bibînî, ne caşekî berûmet.

Rabû û çû oda xwe.

Piştî ku Marya îvanovna bi diya nûn re tene ma, planen di sere xwe de hinek ji diya nûn re kat kir. Diya nûn bi hesren çave xwe keçik hemez kir û banî Xwede lor ku ev fikren di

sere vve de bi ser keve. Amadegiya revvîtiya Marya îvanov-  
naye hate Ýçirin, û piştî çend rojan bi Palaska û Savelyîç - ye  
ku bi diyvvarî em ji hev qetiyar û edî bi destirmaniya li ber de-  
ste vve, xema xwe direvand - ve da ser riya Peterbûrge.  
Marya îvanovnaye bi serfirazî xwe gihand Sofîyaye(\*). Piş-  
tî bihîst ku Çariçe U Tsarkoye Seloye ye, vve jî biryara xwe da  
ku li vvir bimîne. Li heleke ode quncikekî bi çîtan dorgû-tî je  
(\* Sofîya: Li nizîkî Petersbûrgi, beşekjigundi Tsarkoye Selo  
(Gundi Çar) ye.

138

re veqetandin. Jina pasebane guzergehe tavile navîna xwe û  
Marya îvanovnaye xweş lor. Serî gave, xwarziya nûn argûndada  
qesre ye, got û je re yek bi yek qala hemû veşartiyen jiyana  
qesre kir; Çariçe di kîjan wextan de ji xew şiyar dibe, kengî  
qehwe vedixwe, kengî derdikeve gera sibehe, di vve deme de  
kîjan kesen bi navûdeng di qesre de li ba vve ne, çi peyven ku  
do evare li ser texte xwarine gotine, evaran ke dihevîne... Bi  
kurtî, ev tiştên ku Anna Vlashevnyaye kat kirin, bi qasî çend  
rûpelen dîroke heja bûn û bi rastî jî ji bo nivşe dahatû tiştine  
giranbuha bûn. Marya îvanovnaye ji dilûcan guhdariya vve  
kir. Dûre bi hev re derketin nava bexçe. Anna Vlashevnyaye  
çîroka her pirek piçûk û her darek seve je re kat kir. Piştî  
gera xwe dîsa veqeriyar guzergehe û herdu jî ji hev xweş bûn.  
Marya îvanovna sibetire zû ji xew şiyar bû, kincen xwe U  
xwe kir û bedeng derket nava bexçe. Sibehek gelek xweş bû.  
Pelen daren ûdamûran edî bi pelen baye payize zer bû bûn û  
di bine tava roye de dibû-iqîn. Ruye ava deryaca mezin beliv  
bû û li ber roye vvek neynike diçû-ûskî. Çûken ave nû ji lîsa



xwe şîyar dibûn, ji nav zilen qeraxe deryaçe radibûn û xweşik xweşik bi ruye ave diketûy. Marya îvanovna ber bi mergek xweşik çû. Ji bo serketinen Pyotr Aleksandrovîç Rûmyantsev(\*) bi demeke bere naha li vir beryadek hati bû daçikandin. Ji nişka ve fînoyekî gevvr î îngîlîz derket peşiya vve û bi evvtin ber bi vve bazda. Marya îvanovna tirsîya û di tiye xwe de ravvestiya. Di ve navbere de xweşdenge jineke bihîst.

- Netû-sîn, evv gez nake.

Dema ku li hela deng nehirî, dît ku li ser benka peş beryad jinikek rûniştiye. Marya îvanovna jî li hela din î benke rûnişt. Jinike hûr hûr li vve dineri. Marya îvanovnaye jî çend caran di bin çavan re, ji serî heta lingan H vve nehiri. Şevldrasekî sipî û fanolîyekî pîqol le bû. Ê kumekî şeve dabû sere xwe. Jiya vve li dor çel salî dbaýya. Li rûye vve i soravî û dagûtî malmezinî - (\*) Pyotr Aleksandrovîç Rûmyantsev: Generalekî ûris e, di seri tirk û ûrisan de serketinin mezin kirine. Ji hila Katerîna II. ve bûye mereşal.

139

yekserbilind dbcuya. Çave vve yen heşîn û pişirîna vve ya bi sere levan, bedevviyek bepîvan le dida xuyakirin. We berî bedengîbû-

îûgot:

- Wusa xuyaye, hûn ne ji vir in?
- Rast e, ez do ji gund hatim.
- Hûn bi de û bave xwe re hatin, an?
- Na xatûnxan, ez bi tena sere xwe hatim.
- Bi tena sere xwe! Baş e, le hûn hej gelek civvan in...
- Min ne de û ne jî bav heye.

- We çaxê dive hûn ji bo karekî hati bin vir, ne vvusa?
- Bele xatûnxan, nûn daxwazek ji Çariça me heye, loma.
- We de û bav nîne. Reng e, neheqiyek an jî xûabiyek li vve bûye û hûn e jî güiye xwe bi vve de bikin, ne?
- Na xatûnxan, ne ku nûn dad dive, ez ji bo dilovaniye hati-me vir.
- Aya ez dikarim bepîrsim ka hûn kî nin?
- Ez keça Mîronov î kapîtan im.
- Mîronov î kapîtan! Evv i ku li dor Orenbûrge femandare kelayeke bû, ere?
- Bele xatûnxan.

Xuya bû jinik diltenikî bû bû, bi zancvveşîyek şerintir:

- Li nûn biborin, got. Ez naxwazim tekili kare vve bibim. Le ez li qesre me. Hûn daxwazen xwe ji min re bi lev bikin, meriv nizane le dibe ku alîkariyek nûn U vve bibe.

Marya îvanovna rabû ser xwe, xwe tevvand û bi geramî sipasî le kir. Xwîna vve pû- U ve jinika nenas keliya bû û bavveriyek mezin pe dihanî. Dûre kaxezek tevkiî ji berflca xwe denrist û bi geramî direjî vve kir. Jinike kaxiz gû-t û xwe bi xwe xwend.

Bere bi daxwazek jidil û rûkeniyek xwînşerîn dixwend. Le dûre ji nişka ve xranşerûüya U ruye vve vvenda bû û mirûzekî hişk û sar, xwe li ruye vve da der. Marya îvanovnaye çaven xwe ji liven vve ne dikuta. û ü hember ve guherîna jinike tû-sek kete dile vve.

Jinike bi livek sar:

- Daxwaza vve ji bo Grînyov e, ere? Ne gengaz e ku Çariça

vvî bibore. Levvra ra ne ji ber naşîtî û nezaniya xwe, evv rasterast yekî becir û xeternak e ku loma xwe da hela seroke serhil-daran!

Marya îvanovnaye:

- Ax, ev ne rast e! got û naliya.

Jinik sor bû û:

- Cima, ev ne rast be? got.

- Ne rast e, bi nave Xwede ne rast e ev! Ez bi hemû tiştî dizanim, ez e ji vve re çelî hertiştî bikim. Çi tiştâ ku di sere vvî de hatin, hemû jî ji bo nûn bû. Ku ra begunehiya xwe ne parasti be, ne xwestiye navnotî bi pey nûn keve, loma.

Piştî van gotinen xwe Marya îvanovnaye evv hemû tiştên ku xwendevan pe dizane, di careke de kat kir.

Jinike baş le guhdarî kir û dûre je pirsî:

- Hûn li kudere dimûn?

Piştî ku bihîst li ba Anna Vlasyevnaye dimine, bi pişirin got:

- Hû, dizanim! Baş e, de ve gave bi xatire vve. Ji kesekî re çelî ve hevîdîtûya me neke. Hevedar ûn ku ji bo girtina bersiva nama xwe, hûn e gelekî nepen.

Piştî van gotinen xwe rabû ser xwe, di nav daran re da ser re û çû. Marya îvanovna jî bi dilekî xweş û hevîdar vegeriya mala Anna Vlasyevnaye.

Xwediya male U hember ve liva vve derket û got; ji bo saxiya keçek berzevvacli sibehen payize geren weha, ne baş in. Dûre çû semavver hanî, kasiken çaye dagirt û edî fikir ku dest bi avvaniya dûr û direj ya qesre bikira. Le di vve gave de duruşka qesre hat û li ber peliken derî sekini. Destirmanekî

qesre kete hundur û da zanîn ku Çariçe, keça Mîronov î kapî-  
tan banî qesre dike.

Anna Vlasyevna ma behitî, dest û lingen vve li hev geriyan  
û bi qerin:

- Xwedeyo! got. Çariçe vve gazî qesrâ dike! Aya ji kudere  
pe dizane ku hûn li vir in? Baş e, le hûn â bi çi avvayî derkevin  
hafa Çariçeye, diya min? Tirsî nûn ev e ku hûn e nizani bin  
vvek qesriyan gava xwe bavejin... Nizanim ez jî bi vve re vve-  
141

rim, . an ne? Bi kemani nûn e du se şîret li vve bikira. Ü ya  
din, ma hûn e çavva bi van kincen xwe yen revvitiye biçûy qesre?  
Ez nizanim, me bişanda pey dadike û fîstane vve î zer bixvesta  
gelo?

Destirman pe da zanûy ku Çariçeye gotiye; bila evv bi tena  
sere xwe û çi kine li vve ne, bila bi vvan ve vvere. Tişte ku zede  
bihata kirin tunebû. Henveha Marya îvanovna çû di duruşke  
de rûnişt, bi şîret û lavayen Anna Vlasyevnaye bere xwe da  
qesre.

Marya îvanovna nivisa eniya xwe di xwe de hîs dikir û dile  
vve di defa singe vve de bi pet le dida. Piştî çend deqan duruş-  
ke xwe da ber deve deriye qesre. Marya îvanovna bi gaven  
lerzok bi pelikan ve hilkişiya. Li peş vve, derî heta davviye vedibûn.  
Di ber reza gelek ödeyen vala û xweşxuya re derbas  
bû. Destirman li peş diçû û re peşanî vve dikir. Dûre hatin li  
ber deriyekî girtî sekinûy, destû-man Marya îvanovna ü vvir bi  
tene hişt û ket hundur ku hatina vve bide zanîn.

Dema keçik difikirî ku evv û Çariçe e pergî hev bibin, ji  
hele de diket û bi diyvvarî li ser xwe disekinî. Piştî demeke

kurt derî vebûn û Marya îvanovna kete oda Çariçeye. Çariçe li ber masa xweçekirine rûnişti bû. Çend nedîme li dora vve rûnişti bûn. Dema ku çav li Marya îvanovnaye xistin, ji ber vve bi geramgirî xwe dan hev û cî dane vve. Çariçe bi pişirmek serîn le vegeriya û nehirî. Marya îvanovnaye tavile evv nas kir. Bi qasekî bere li nav bexçe ji dilûcan bi ve jinike re peyivî bû. Çariçeye banî vve kir ku nezfletir vvere û dîsa her bi vve pişirîna xwe got:

- Ez gelek kefxweş im ku ez li ser soza xwe sekinim û nûn daxwaza vve bi cî hanî. Kare vve li hev hat. Ez beşik pe bavver im ku dergistiye vve beguneh e. Evv kesî ku evv e bibe xezûre vve, min je re ev nama nivisiye. Ji kerema xwe re bibin û bi destê xwe bidine vvî.

Marya îvanovnaye bi desten lertzok name girt û bi girî xwe havete lingen Çariçeye. Çariçeye evv rakir, maç kir û got:

- Ez dizanim ku hûn ne devvlemend in. Le ez deyndarî keça Mîronov î kapîtan im. Ji bo peşerojen xwe qet hus-  
142

tuxwar nebin. Hemû pevvistiyen vve li ser nûn.

Piştî ku Çariçeye gelek peyven tenik û xweşik ji keçika sera re gotin, evv dîsa bi şûnde bi re kir. Marya îvanovna dîsa bi vve duruşka qesre, ji qesre veqetiya. Anna Vlasyevna ku betevvat h bende vve bû, pks li ser pirse ji keçike kk. Marya îvanovnaye jî bi kin û kurtî pksen vve bersivand. Anna Vlasyevnaye ev bersiven vve li dile xwe gkti bû bi rastî. Le dîsa jî ev sedema da xatke fediyokiya keçen gundî û bi dilpakî Marya îvanovna bexişand. Marya îvanovna beyi ku bibeje ez ji xwe re hinekî li Petersbûrge binerim, di vve roje de bi

şûnde vegeriya gûnde me.

-DAWÎ-

Serpehatiyen Pyotr Andreyîç Grînyov li vir dawî te. Li gor gotinen malbata vvî em tedigihejin ku; di daraya sala 1774 de, bi fermanek taybetî ji bendîxane hatiye berdan, di dardekirina Pûgaçev de bi xwe li vvir bûye, çapûlger di nava koma merivan de evv nasiye û bi serhejîn silav le kiriye. Ev seriya piştî gaveke hatiye jekirin û tev xwîne pişane xelke bûye. Piştî demeke kurt jî, Pyotr Andreyîç bi Marya îvanovnaye re zevvucîye. Aniha zaroken vvan li bajare Simbîrske bi bextiyarî dijîn. Bi qasî sî verstan ji X...e dûr, gûndeki bi zeviyen deh mîran heye. Bi dîvware mala mîrekî ve, bi cam û çerçove nameyek dardekirî ye. Ev nama bi destnivisa Katerîna II. hatiye nivisîn û ji bave Pyotr Andreyîç re hatiye şandin. Te de begunehiya lawe vvî û pesne dilpakî û baqiliya keça Mîro-nov î kapîtan pe dide zanîn.

Ji neviyen Pyotr Andreyîç, yekî bihîstiye ku em li ser we deme kar dikin. Ji ber ve yeke vvî jî ev destnivisa kale xwe î ku evv dema vvek çîrok nivisiye, da me. Bi destura malbata niviskar me jî biryara xwe da ku em viya vvek ku hatiye nivisîn, bivveşînin. Le tene li gor sere her beşî me nivîsek peyda kir û me hinek naven taybetî guherandin.

19 Çele payiza sala 1836

Weşanger

143

\*\*

KEÇA KURD XANÊ

## ROMANA KÛRDÎ

### BIRÎSIDAR

### PÊŞGOTIN

Iro li her welatî evîn, evîndar, evîndarî- û dilketin heye. Kîjan welat be bila bibe, kîjan gel be bila bibe û li kîjan'kûçê cîhanê- be bila bibe. hebûna evîn 13 evîndariyê tişteki b ê guman e. .

Evîndarî tenê li ser tişteki nabe, angos - J mirov tev nikarin evîndarê tişteki tenê bibin. Her evîndar li ser rêça dilê xwe diraeşe û li dermanê dilê xwe digê rê, dilê wî têkeve çî. evîn darê wî tiştî dibe.

Car bi caran qîz û xort dil dikevin hev- û bi agirê evînê dişewitin. Gelek caran qîz- an xort ji ber ku, ne gihane meqsed û miradê- xwe. xwe bi dar ve kirine an jî bi cûreyekî- din xwe goriyê evînê kirine. Ev li her welatî- tişteki ber bi çav e.

Lê carina evîndariyên dilşewatir çê dibin. Neraaze li welatên ku binuest mane, li we- latên ku. gelê wî tîn perçiqandin û li welatên ku»dewlemendiyên wî yên ser erdîn û bin erdîn tîn talan kirin de pir çê dibin. Ev evîn jî evîna welat, evîna serbixwebûna welat û aza diya gel e.

Gelek hozan, gelek dengbêj û gelek huner- mend evîndarê welatê xwe bûne, derd û kulên welatê xwe û gelê xwe anîne ziman, gelek ji- wan bi evîna welatê xwe çewitîne, dilê wan ji- bo welatê wan lêxistiye. Gelek , ji wan derd u kulên xwe an li ser kaxezan rêz kirine an jî bi deng û ttembûrên xwe ve anîne ziman û sede- ma(ûşt- sebeb)evîndariya xwe bi xelqê dane za- nîn û bi wan fêmkirin dane.

Gelê wî welatî, keç û xortên wî welatî ji evîna welat bê par nemane. Wan jî gelek caran axîn û keser ji bo welatê xwe berdane. wan jî gelek caran di dilên xwe de tenê cîh dane evîna welatê xwe.

Em dikarin bêjin ku, yek , ii wan welatên ku- evîndar , ii bo xwe şewitandine welatê me Kur-distan e. Iro di welatê me Kurdistanê de ge- lek bi evîna welatê xwe şewitîne. Ji xeynî mi- rovên ku xwe firotine, , ii xeynî Axan^êxan- cahş û nokeran, ii xeynî xwe nenasan. Iro mirov here cem kîjan keç û xortan - cem zarokekî Kurd, ew dizane ku welatê wî he ye û navê wî Kurdistan e, ew dizane bêje ez- Kurd im û lawê Kurda me. PiçGk û mezinên Kur dan mêranî û hebGna xwe, hezkirina welatê xwe bi sitran û lawikan, bi xweşxwan(marş)G- nivîsaran ve didin diyarî kirin. Ev tev ji - pêçveçGna xebatê û tekosînê pêk tê.

Lê tiştêkî din li welatê me p^yla dibe - ku ew jî tiştêkî pir ne baş e. . Ew jî fam ne - kirina evîna keç û xortan e, ango dîlîtiya(ko- letiya)jinan e.

Gelek bav û dê, gelek êl ^Veşîr keçên - xwe an bi zorê didin an Li bi zor keçên xelkê tînin, ango keç û xort bi zewaceke bê dil digihin hev. Çaxa xortÊ^wîndar tengazar be rewşa wî bêtir ne xw^dibe. Bavê qîzan nax- wazin keçên xwe bidin kesên bê mal û reben. Qelen dixwazin, qelenekî pir giran. Keçên me- weke mal an lawiran tînin firotin. Keçên me li ser daxwaza dê û bavê xwe digihên rairovên bi- yanî û ne nas, bê dil û bê evîndarî dikevin nava zewac û jjiyaneke dijwar.

Gelek caran keç û xortên evîndar û dil ketî ji bê çareyî hev direvînin û xwe davê- ;)in bextê mirovên dewlemend an bi rGmet.

Bi vî awayî keç û xort digihin meqsed û- miradê xwe. Lê gelek caran bav û xwediyê keç- an bi dG wan dikevin, çaxa wan bibînin an keç- kê bi zor ji xort disitînin an jî hev diku- jin û dibin dijmin ji hev re.



Lê ev tiştên ne baş tev ne tawana(sûc)me- Kurdan e. Ev tev tawana hebîna nîrên Feodalîz- raê û sermayedariyê ye, Hebûna nîrê olperestî- û misilmantiya kevin û gemar e.

Di paşmayîna gelê Kurd de hê bûna Feoda- lîzmê, tawanbar(yê bi sûc)dijmin e. Dewletên s erdest yê ku, welatê me ji xwe re par ve kirine, bi zanatî em di nava şevên tarî de hiştin. Daxwaza wan paşmayîna Kurdan û ne ' yarbûna wan bû.

Bi ser de hebûna olperestî û mis^Lman ya bê binî em bêtir kirin nav tariya ' ne hişt ku, em ronahiyê bibînin û p bin. Di derketina ola misilmantîyê de şemaqa mezin û giran li jinan ket. Ji bei^ft, şerî- eta misiimantiyê destfir ne dida ku, jin azad û serbest bin, weke mêran û di nava mercên wekhevîyê de bijîn. Tenê şerîet^ destûr da ku-

Berî ku Kurd bi zora ço(şflr) bîn misil- man kirin, di dîrok fl civata gelê Kurd de, jin- fl mêr ji hev ne dihatin cihê kirin, cîh fl rû- meta jinan gelekî bilind bfUjin îî weke mê - ran xwedî «naf bûn. Pir caran mal u malbatên- ê l fl eşîrekê bi temamî di bin dest û geran- dina pîrekekê de bû, wê seroktiya êl û eşîrê dikir û ew ji êrîqên dijmin diparast. Dan û- sitandina di navbêra jin û raê ran de, jinanîn û mêrkirin, karş mal fl derveyî malê gelekî pŞketî bûn. Azadiyek fireh D bê tixûb di nav- bêra jin fl mêran de hebû.

Lê belê bi wergirtina Ereban re, hemû tişt hatin guhertin. Toreya Kurdan ya kevnare ne

ma .

Di şûna wê de tore û mercên bingehîn yê ola misilmantiyê yê n pûç 15 gemar cihê xwe wergirtin. Qelen, çadira reş, laçik û tiçê n din peyda bûn. Pir tiçên toryê n Ereban ketin nav civata gelê Kurd û toryê n gelê

Kurdan rtrlneta jinan 15 qedrê wan di vai gotinê n jê rîn de dane diyar kirin

"Şşr çê r e çî iin e çî raêr e"

"Jin stûna mais ye"

"Mala bê jin, wek dara bê fê kî ye" û. h. w. d

Lê em nikarin bê jin, ku îro jinê n Kurdan xwedî mafê xwe yê n bingehîn in. Hebûna nîrên feodalîzmê ê pŞşveçûna sermayedariyS ya li Kurdistanê yek ji sebebê n perçiqandina jinan e. Heta ku civat û risteke feodalîst û serma yedar hebe, perçiqandin û gerdenxwariya jinan misoger e. Eşandin, perçiqandin û zordestiya li s er jinan 15 gerdenxwariya wan ji ber hebûna risteke feodal, nîv feodal û sermayedar e. Ji ber hebûna refbn serdest û jê rdest in. Heta ku di nav civatê de, çî civata gelê Kurd be 15 çî civatê n sermayedar »feodal 15 nîv feodal ên cîhanê bin, refê n serdest û jê rdest he- bin, jincjî serbesti 15 azadiya xwe bê par in. Ji lewre, rizgarbûna jinan»serbesti 15 azadiya wan bi rizgarbûn 15 serfiraziya refên karker 15 kedkaran ve girê dayî ne.

Heçî jinê n Kurdan in, divê rizgarî 15 ser-firaziya xwe di riya rizgariya gelê n Kurdis- tanê 15 xebata wan ya ji bo avakirina Kurdis- taneke serbixwe, yekbl5yî, demoqrat 15 sosyalîst- de bibînin. Ji ber vê yekê divê jinê n Kurdan di gel jinê n gelê n Kurdistanê milê n xwe bidin milê n mê rê n rizgarîxwaz yê n şoreşger 15

welatparêz. Wek pêçmergên raêrxas û leheng xwe biavêjin qada şer Ê doza rizgariya wela- tê xwe yê bindest û refên kedkar yê n jêrdest pêçve bibin. Xwe bigihînin hev. rêxistin 13 - saziyên xwe çêkin û di xebatê de rola xwe ya mezin bilîzin

Wê çaxê wê keç O xortên Kurdan bêtirs evîndarê hev bibin, wê bêtirs hej hev bikin û dil têkevin hev, wê çaxê wê jin û mêr wek hev bibin û bi dilxweşî û serbilindî di we latê xwe de, di nav gelê xwe de y

Ev romana jêrîn mêranî û desthilanîna jin tl keçên Kurdan dide ber çavan. Weke ku bav tl bapîrên me gotine:

"Şâr çêr e çî jin e çî mêr e"

Ji keç 13 xortên Kurdan re diyarî dikim

Ş\_ÎJL?\_O\_A\_R\_

Nexweşxana Elmanya

1982

X A N Ê

Di gundekî Kurdistanê de mirovek bi navê Ehmed hebfl. Ev mirov halê wî ji yê gundiyan xweştir fl dewlemendtir bû. Ji ber ku. halê wî ji yê gundiyan xweştir bfl, gundiyan jê re- Ehmed axa digotin. Ehmed ji navê axatîyê- aciz bfl, lê cardin gundiyan bi navê axatîyê ban wî dikirin.

Ehmed hînî wî navî bfl fl navê wî ma med axa. Ehmed axa car bi caran alîkarî gundiyan dikir fl ew diqedandin. G-undiye ku bê erd fl bê zevî bfln. di erda Ehmed axa de . dixebitîn fl debara xwe dikirin.

Ehmed axa ji navtêdanê pir hez dikir. Weke her axeyekî wî , 1Î di civata xwe de nav di xwe dida fl pesnê bav fl bapîrên xwe dida. Ehmed axa wek axayê din ne ealim bfl. Zor fl- tehdâyî ne dida gundiyan. Ji wê yekê gundiyan îî he3 wî dikir fl êvaran li mezela wî kom dibfln fl diketin nava dabaş fl bflyerên dem fl dewranên berê.

Ehmed axa hertim doşekê hirî li bin fl balîfeke nerm Jî li ber pala wî bfl. Çay fl qehwe ji ber kê m ne dibfl. Herdf l lingên xwe diavêtin ser hev, boqên simbêlê xwe ber bi- jor ve ba didan fl fire fir li qehwê dixist.

Êvareke. cardin mezela Ehmed axa ji gundiyan hatiye dagirtin, çayê fl qehwe li ber- wan rêz kirine fl ketine nava dabaşan(mesele) Ehmed axa cardin simbêlê xwe ba dide dest bi navtêdana xwe dike fl ji gundiyan re qala eşîrên berê dike fl dibêje:

-Erê. . . hfln bi rewşa eşîrên berê nizanin. . . di dema xwe de eşîr ji eşîra me xurtir tune bfln.

Eşîra me li her cîhî deng da bû. . . nexasim bavê min, axa weke bavê min bi nav Ê deng tune bûn. . ne hûn nizanin bê ew çi şêrê çiyar bû. . ne hûn nizanin bê ew çi fêris û egîd bû. Rehma xwedê lê be, simbêlin sor û qeytanî li ser bûn, mirov dima ecêb mayî. . . bejn û bala wî bilind û dagirtî. pişt û sînga wî weke û ferçên serê biran bû. . . lo bavo ji nîşanû re kes ne digihayê»biavêta derziyê dipekand 'S winda fikir, hevqasî ku nîşangir bû.

Gundiye kî jê pirsî:

-Ma gelo axayê me çend meriv kuştî bûn?

-Tew tew tew. . . ;ji xwe mêrên ku bavê min kuştî bûn nayên hejmartinê. . carina ew bi tenê li hember eşîrekê disekinî û zora wan dibir weh. . ma mêr weke bavê min hebûn kuro. . . i

Gundiyan dizanî bûn ku Ehmed axa hine- kî bi ser ve zêde dike. Le dengê xwe ne diki- rin. Ji ber ku Ehmed axa ji bo wan baş bû û ne zordar bû.

Bi vî awayî her şev gundî li mezela Ehmed axa kom dibin, çayê û qehwa xwe vedix- win û ji xwe re dixivin. Her car Ehmed axa wê

simbêlê xwe ba bida, firînî li qehwê xis- ti biwa, tizbiya xwe şerqe şerq iê baniya û dest bi tiçtên ku berê qewimî bun bikira.

Gelek caran Ehmed axa dor(ger)dida gundiyan jî, wan jî çîrok, dabaş»sitran û lawik digotin û şeva xwe bi kêfxweçî diborandin.

Ehmed axa bi jin bû, du lawên wî hebûn. yê mezin li malê kar dikir û yê piçûk jî diçû dibistanê. Jina Ehmed axa bi hemil bû.

Ew li benda kurekî an jî keçekê bûn. . .

Di ser re çend roj derbas dibin. îva rekê cardir gundî li mezelê kom bûne û ci- vata xwe danîne.

Ji xwe re weke her êvar çîrok, dabaş, sitran û lawikan dibêjin.

Carekê ii niçkê ve xulameke axê kete hin- durê mezele û got:

-Axa, mizgîniya min li te keçeke te çê bêl Çaxa Ehmed axa ev gotin bihîst, ji kêfa re xwe winda kir û heraa li nava mezelê rabû û dest bi govendê kir. Gundiyeke jî jê re si. ti- ra. Piştî qederekê Ehraed axa çû mezela jina- xwe û dît ku, vaye keçeke piçûk li ber sînga wê ye. Ehraed axa rabû çû aniya jina xwe mac kir, paç ji ser keçikê hilanî, nerî k

Ehraed axa vegeriya û hat mezelê vatê. Xelkê li civatê tevda ew pîroi çavronî bûn danê, ewjî gelekê kêfxweç bû.

Piştî qederekê xortek ji nava gund hat û ni Gêncî re got:

-Gêncî, çavên te ronî bin lawekî te çê bûl

Gêncî hema ji nava civatê rabû s er xwe û berê xwe da malê. Çû raalê ku, çi bibîne, vaye lawikek piçûk û lewend TK ber sînga diya xwe- raza ye.

Gêncî aniya pîreka xwe maç kir û got:

-Bijî dayika kurê min, tu çiqasî baş û rind î.

Pîreka wî j - kêfa re hêstir ji çavên wê dihatin xwarê.

Gênco rabû cardin çû nava civatê. Civatê ew pîroz kir.

Ehmed axa got Gênco:

-Çavên te ronî bin Gênco, ma kurê te çeleng e?

-Elhemdulah axa, baş e, xulamê te be. .

-De xwedê wî bihêle

-Xwedê ji te razî be

-De gundîno, sibê ez ê heft roj û heft şevan govendê li dar xim, divê hûn xwe tê de biêçi- nin ha!. .

-Ser çavan, ser çavan. . . .

Wê çevê axe qehwe li ser qehwê da çê kirin û li ber gundiyan rêz kir. Hetanî derengî şevê axivîn û bi kêf şeva xwe borandin.

Adinî ro;jê Ehmed axa çend gewende(dahol- van û zirnevan)girtin fi dest bi govendê kirin.

Gundiyan li ser daxwaza axê, dev ji karê- xwe berdan fi ketin govendê. Ji gundên dorhC- lê jî xelq dihatin fi diketin govendê fi kêf dikirin.

Destbirakê Ehmed axa heye, navê wî Emer axa ye. Di wê rojê de lawekî wî jî çê bû- ye. Wî bihîsti bfi, ku keçeke Ehme' axa çê bfi- ye û govendê dikin. Hema bi xar radibe çend xulaman dide dfi xwe fi tê govendê.

Carekt Ehmed axa dît ku va Euer axa li ber çavên wî ye. Hema herdiwan xwe avêtin hev fi hevdû hembêz kirin.

-Tu li ser çavan hatî Emer axa, çi ecêb çêbfi ku tu bi vanderan de hatî lo?

Wey çavên te ne êçin, wele min got ez ê herim serîkî li destbirakê xwe Ehmed axa xim- fi wî pîroz bikim.

- Ehlen û sehlen, ser çavan. De kerem bikin em herin mezelê rûnin, aniha hûn bê nan in.

Piştî ku têr nan xwarin, vekîşyan û piş- ta xwe dan balîfan(balgehan) û li rehetiya- xwe mêze kirin. Piştî xwarinê ji wan re qeh- we jî anîn.

-Ê, Emer axa. . rewşa te û halê te çawan e?ma- tu zarokên te yên nû çê ne bûn? an tu nema- zarokan dixwazî?

-Ha ho. . ma meriv çawa zarokan naxwaze Ehmed axa. . bi xwedê doh lawekî min çê bû, û min na- vê wî kir"Misto'. 'Min navê bavê xwe lê kir. .

-Ha, pir baş e pir baş e, xwedê wî bihêle. Min jî navê keça xwe kiriye"Xanimê" ji ber ku navê diya min jî Xanimê bû.

-Pir baş e pir baş e, navekî pir xweş e. Ev adetek ji yê me Kurdan e, çaxa meriv navê bavê xwe an diya xwe li zarokên xwe bike, meriv wan ji bîr nabe, bi bankirina navê wan re ew tên bîra meriv. . . erê. . rehma xwedê lê be çaxa min navê bavê xwe li kurê xwe kir, bavê min hat ber çavên rain. . çavên min tijî hêstir bûn. . . . dinya lê ne hêjaye birako. . .

-Rast e. . ma em çawa bikin heyran. . qedera xwedê ye. . her tişt di destên wî de ye. . bila rehma xwedê li miriyên tevan û yên haziran be.

Herdû destebiran ketin nav dabaşên berê qala eşîr û şerên berê dikirin. Bi dîtina hev kêfxweşbû bûn, kul û derdên xwe ji hev re digotin. Geh dikeniyên geh çavên wan tijî hêstir dibûn, carna jî henek dikirin.

Ha , ii vir û ha ii wir, Emer axa daxwaza - dilê xwe got:

-Heyran ez bi rastî bêjim, bi xwedê ez hatime keça te ji lawê xwe re xelat bikim. Ma gelo tu çi dibêî?

Ehmed axa hinekî fikirî -Ez nizanîm. . hê pir zû ye, gelo çaxa ew rae zin bibin wê bi hev qayîl bibin?ii bo vê meke dirêj û derbasbûyî divê. . divê em 1 da mezinbûna wan bis ekinin.

-De lo. . keça te keça axa ye û lawê min \_ lawê axa ye, ma çawa bi hev qayîl nabinttu çiqas qelen bixwazî ez ê bidim, e^mjsr te hazir im.

-De heyran tu dizanî, min keça xwe da û çû. tu çiqas qelen didî tu dizanî.

-Haa. . ka destê xwe destbirakê delai. . îcar pir baş bû.

Piştî van gotinan Ehmed axa -(5 Emer axa derketin nava govendê û Ehmed axa got:

-Gelî guhdaran, ji îrd^pê ve keça min Xanimê dergistiya lawê Emer axa ye, divê hûn tev zanibin.

O govenê cardin dest pê kir. Herdû axa jî ketin govendê û xwe hejandin.

Ber êvarî Emer axa destûr ji Ehmed axa xwest û b^ê xwe da gundê xwe. Wî î çû heft ro, i û heft şevan govend ji bo lawe xwe li dar xist. Wî li gund da zanîn ku keça Ehmed axa dergistiya lawê wî Mis to ye.

Ev adetek ji yê welatê me ye. Ji piçûka yî de keç û lawan ji hev re xelat dikin û dibin tawanbarê zewaceke bê dil û jiyane ke dijwar.

Gènco gundiyeke belengaz e. Li cem Ehmed axa dixebite. Çend pez û dewarên wî hene.



Bi xwe kûrdeki dilpaqij, baş û mêr e. Gêncî- co navê lawê xwe kiriye "WelatV Ev nav di gund de tune bû, gundî li navê Welat ecêb mayî diminin. Tifingeke Gêneo heye pir 1 dê lai e. Gêncî şivantiya Ehmed axa dikir. Ehmed a?a , Îl salê çend sewal didan GÛncî.

Gêncî êdî difikirî, lawek re çê bû bû. Belengaz bû, nikarî bû ew bida xwendin. Ji bê- gavî(mecbûrî) diviya bû ew jî bide ser rêça bav û kalan û şivantiyû bike. Ji xey vû tu çare tune bû. . .

Dem derbas bûn sal derbas bûn. Xanimê û Welat ketin sala nehan û dehan, ango neh deh salî ne. Xanimê di nav hevalên xwe de bi navê "Xanê" tê nas kirin. Hevalên wê iê re Xanê dibê^in.

Welat her roj bi hevalên xwe re diçû ber kar û berxan. Bavê welat Gêncî pir dilxweş bû ku. lawê wî mezin bû ye û diçe ber kar 13 berxan.

Çûna ber kar û berxan ne tenê karê la- wan bû. Keçên di çaxa hev de jî bi lawikan re diçûn ber kar û berxan. Wan kar û berxên xwe tevlihev dikirin û bi hev re diçûn ber wan û ew diçêrandin.

Welat lawekî pir lewend û xwîn şîrîn bû. Hevalên wî pir hej wî dikirin, Welat jî hej hevalên xwe dikir.

Keç û xortên piçûk li ber kar û berxan ji xwe re dileyistin. Pirê caran bi çavgir tînkê dileyistin û pir caran jî bi lak û gok dileyistin. Lê ji nava wan keçek kêmbû ew jî keça Ehmed axa Xanê bû. . .

Xanê li malê pir aciz dibû. Hevalên wê tev diçûn çolê ber kar û berxan û ji xwe re dileyistin, lê ew tenê di quia xanî de dima, çaxa ew aciz dibû, radi bû û dest bi girî dikir û digiriya.

Ro^ekê cardin Xanê ;ii acizbûna digi rî. Ehmed axa ban jina xwe dike:

-Keçê ma ew çima digirî lê?cardin çi hewala wê ye?

-Ma ez dizanim, ji acizbûna digirî, ileh di bêje ezê bi hevalên xwe re herim ber kar û berxan û li çolê bileyizim.

-Na qîza min na, tu qîza axayî divê tu li mal be û divê tu li ser xwe be.

Xanê dev girî bernade -îhî, îhî. . na bi xwedê ez ê herim, ihi ihi, ma ez li malê çi dikim? ez jî aciz dibim. .

-. Kuro de destûra wê bide lo. . ma wê çi bibel ew li malê bi tenê aciz dibe. bila keçik ne girî heyran. .

Ne rojek ne du roj. Ehmed axa nerî ku weha nabe, destûra keça xwe Xanê da, ku ew J< here ber kar û berxan.

Rojekê cardin zarok tev li hev civiyî kar û berx dan ber xwe û berê xwe bi kêf çolê. Zarokan carekê nerîn ku, va keça axê Xanê jî li nav wan e, tev de pir ecêb mayî man. Welat û Xanê di ber hev re dimeşin. Care kê Welat li Xanê dinere û carekê jî Xanê li Welat dinere.

Welat jê re got:

-Ma tu çawa hatî nava me. bavê te dengê xwe ne kir?

-Ez pir giriya. Ji bo wê destûra hatina min da. Ji ber ku ez bir aciz dibûm.

-Baş e, tu ji îro pê de dibî hevala me, tu soz didî?

-Belê, ez ji îro pê de hevala we me, em ê tim bi hev re bin.

Welat ji kêia rabû çû û rûwê Xanê maç kir. Xanê jî Welat maç kir.

Hevalên wan kenîn û gotin:

-Ha ho. . kuro Welat keça axê maç kir, ev çi mêrxas e lo. . ha ha ha ha ha. . . .

-Ma çi bû ye lo? em hevalên hev in ma çi qewimî?

-Rast e, ma çi bû ye?ez ne keça axa maxa me e-', ^i îro pê de hevala we me. Lê divê hûn Ji bavê min re tiştêkî nebê^in ha. dûvre hevaltiya me xirab dibe.

-Na na kes nabêje.

-Ji min re nebêjin keça axa, tenê bêjin Xanê

Welat her çavên wî li Xanê ye. Yê Xanê jî li Welat e. Ew hê deh sali bûn jî 1ê herdû li ber dilên hev şîrîn bûn.

Hevalên wan zanî bûn ku, herdû hej hev dikin û hertim çavên wan li hev e. Lê kesî den- gê xwe ne dikir, ji ber ku wan pir hej hevalê xwe Welat dikiran.

Carina li ber kar û berxan ji xwe re bi- çavgirtînkê dileyistin. Çaxa dibe çavê Welat Xanê diçe xwe li cîhekî dûr vediçêre, Welat jî lê digêrê . Çaxa hevdû dibinin li cem hev rûdinin û li hev dinerin. Hevalên wan jî ji dûr ve li wan dinerin û dikenin.

Bi vî awayî roi derbas dibin, roj bi roj keç û xort bi xweşî û paqijî, bi kêf û evîn mezin dibin, roj bi roj bêtir hej hev dikin û bêtir bi dilekî xurt dil dikevin hev.

Her şev ne Xanê ji xewna Welat û ne Welat ji xewna Xanê derdikeve. Her şev herdû evîn dar dikevin xewnên hev û kêf û henekan bi hev re dikin.

Di ser wan re meh û sal derbas dibin. Xanê û Welat dibin xort û evîna wan xwe bi ser dil û hinavên wan de berdide û wan dişewitîne. Roja ku Xanê û Welat hev nebînin nikarinl^iştêkî bikin. Ne

nan dixwin ne avê vedixwin. Herdû bi hev hatine girêdan û bûne yek can û yek laç. Tenê hevalên wan, keç û xortên gund, bi evîna herdû evîndaran dizanin Xanê nizane ku, bavê wê ji piçûkanî de ew daye lawê Bner axa û dergistiya Mis to ye Welat wan çaxa ji xalê xwe hînî tembûrê bû bû. Tembûreke xweş lê dixist û di ber re digot , îî.

Rojek ji rojan bavê Xanê Ehmed axa ban qîza xwe dike û jê re dibêje:

-Qîza min, divê ji îro pê de tu neçe çolê

Terqîn bi nava Xanê ket .

-Çima bavo?

-Edî tu mezin bûyî, tu buyî xort. Ji me re şer rae. Dikarin hinek têkevin pêçiya te, êdî divê tu neçe.

Xanê serê xwe dixê ber xwe û hêstiran dibarîne.

Bavê Xanê berdewam dike

-Heta niha me ji te re ne goti bû. Ji piçûka yî ve me te daye lawê Einer axa Mis to. Tu niha destgirtiya wî ye, Mistoyê Eher axa. .

Bi van gotinan hiş û eqil di serê Xanê de namîne. Hêstir ji çavên wê xalî nabin.

-Divê tu ji malê dernekevî. DiNe ku di wexte- kî nêzîk de bîn te bixwazin û bibin.

Xanê ji qehran re bi hêz dikeve û dibê-

Ôe: x

-Ez Mis to nakim, ez xwe dikujim jî cardin ez nakim, ez nakimje” nakim.

Ehmed axa çemaqekê li Xanê dixê -Hişşş. . tu çawa van gotinan li pêş min dibê-

n :

Diya Xtnê dikeve hundir

-Çima tu li Xanê dixî loo? Xanê xwedî maf e wê hê Misto ne dîtiye, te ji piçûkayî de ne - heqî^WjXanê kiri ye, ma hewara Xanê û Misto-bû. . .

-Hişşş. . hişş. . . tu ji van karan tiştêkî fêhm nakî. . . çû ye û qediya ye. . . herkes pê dizane ku Xanê destgirtiya Mistoyê Einer axa ye.

-Tu van gotinan bi serê xwe dibêjî. sibê lawê te ji dibistanê bê ewê nebêje çi'. . . gelo ew vî karî dipejirîne?tu li van nafikirî?

-Ev karê min e, herin mezela din de zû

Welat bijîm. Ez ji wî pê ve tu kesî nakim.

Em herdû îî hev dikin. Ger ez sax bim ji- Welat re û ger mirî bim ji axê re me.

-Megrî keça min raegrî, ez ê di nav we de herim û bSm, tu qet meraqan neke

Diya Xanê pir hej Xanê dike, ew jî heval- bendê wan e.

'e ji malê derk eve der, ba-

\* wextî dîn bibe, çend ro, ^ „ m ne dîtiye. Bi şev û roj

"xîn û keseran dikşîne, êvaran qet xew nake- ve çavên wî.

Dê û bavê Welat ;jî pir li Per dikevin. Çiqasî li ber diğerin ^î, dilê wî geş nabe.

Bave Welat her tiştî dizane

-Lawê min, Xanê keça axa ye. Bavê Xanê keça xwe nade belengazan. Qîz li gund pir in, tu kîjanê bixwazî era dikarin bixwazin, lê keça Ehmed axa tiştêkî pir zor e.

-Na bavo, ez tu jinan naxwazim. Ya ez û Xanê digihin hev yan jî keçên din dê û xwehê rain in. Çavê min li tu keşi din tune ye.

Welat her roj tembûra xwe bi xwe re dibe ber pez. dinale û evîna xwe tîne zima:

"Xanimê lê Xanimê Bûka mala bavê rain ê Tu sebra dilê rain ê Her roniya çavê min ê "

Welat li derve li ber pez dinale û Xanê jî di hundir de hêstiran dibarîne û dil bi- kul e.

Rojekê Xanê ba<sup>^</sup>aiya xwe dike

-Bayê, ez heyranê dayê, min ji zûv de Welat ne dîtiye gelo tu çare peyda nabe ku, ez wî bibînim? niha ew jî ji bo min dinale.

-Baş e qîza min, tu xeraa nexwî ez sibê we tînim cera hev.

Adinî rojê diya Xanê ji Ehmed axa re dibêje

-Kuro li malê şeker û çayê nema ye, divê tu herî bajêr wan bistî

-Wê rojê min sitandi bûn ma çi zû nema? OMa em çawa bikin, her şev mêvan tîn, gundî tîn ji xwe wê biqedin.

-Be baş e ji xwe karê min jî li bajêr hebû.

Bi vî awayî Ehmed axa diçe bajêr, Xanê û diya xwe QI bi xar diçin mala G-ênco bavê Welat.

Çaxa dikevin hundir dibînin ku Welat serî di ber de û difikire.

Çaxa Welat serê xwe rakir Û çav li Xanê kir, rabûn xwe çem kirin hev. Hêstirên wan ji- ber xwe ve dihatin xwarê. Welat û Xanê çûn mezeleke din. Diya Xanê jî ma li cem dê vê Welat.

Welat û Xanê li mezelê bi tena serê ne. Hevdû maç dikin û bêhn dikin.

-Sebra dilê min Xanê, delala min, min bihîst ku tiwê herî ii Mis to re, ez wê ca. 'ê dimirim. Xana min, ez beyî te nikarim bijîm. cana min min sûnd xwariye ku, ji te pêve kesî neynim.

-Ma ez, Welatê min, ez jî weke te sûnd xwarî me, ez jî ji te pêve tu kesî nakira, jîna min malê min her tiştê min tuyî Welatê min.

-Baş e cana min, ma e:i çawa bikin, ev weha nameşe, ev hesret, ev axîn û girî hetanî kengi- wê dom bike?

-Ez jî nizamim Welatê min, ez bi her tiştî bi te re me, bi revandin, bi kuştin, tu çawa bixwazî ez weke te me.

Xanê û Welat hevdû hembêz kirine <3 her dilên xwe nerm û rehet dikin.

Diya Xanê Jî bi dê û bavê Welat re keti- ye axavtinê:

-Birayê Gêncî, bi xwedê hal û dabaş; Ji vê ye. Xanê û Welat he, j hev dikin, Ehmed axa jî wê Xanê bide kurê Bner axa. îcar berî ku Xanê bide kurê Emer axa. divê em çarekê peyda bikin.

-Wele ez nizamim bê em çawa bikin, tu malê me tune ku, era Xanê bixwazin. ez şaş marne.

Hetanî ber êvarî Xanê û Welat ji xwe re kêf û henekan dikin. Piştî dibe êvar Xanê û diya xwe radibin û diçin malê. Ji ber ku dê nia hatina Ehmed axa ye.

Ber êvarî nerîn va Ehmed axa ii bajêr hat. Çayê û şekir jî bi xwe re anî bu. Ji ber ku westiya bû, xwe li ser doşekû û li nava meze- lê dirêj kir û kete xewê.

Welat pir difikire. Lê çareyekê tenê di- bîne, ew jî revandin e, tu riyeke din tune bû.

Lê ew difikirî "çaxa Xanê birevîne, wê bi ku de here, wê xwe bavêta bextê kê? wê xwe bisparta kê? .

Ev tev di serê Welat de diçûn û dihatin. 15 bêgav(raecbûr) bû ku, hezkiriya xwe birevî- ne, ji ber ku, wê ew bidana Lawê Emer axa.

Li aliyê din li gundê finer axa kêf û go- vend e. Govendeke mezin li dar xistine, Kêfa- Mistoyê finer axa gelekî tê. Piçtî heftakê wê- Emer axa here Xane ji lawê xwe re biguhêze.

HADÎ

Hadî xortekî pêçverû bû. Xwendi bû û haya wî ji welatê wî û ji gelê wî hebû. Xortekî Kurd î xwenas bû. Ew li dijî ramanên kevin û li dijî axan û çêxan bû.

Wê çevê gundî tev hati bûn civatê. Gênco- û Welat jî hati bûn. Çaxa Xanê dît ku, hezki- riyê wê hatiye civatê gelekî dilxweş û ser- mest bû, kulên dilê wê hinekî sivik bû bûn.

Wê şevê Xanê heta derengî şevê çayê û qeh- we li ber mêve^i gerand, lê bi piranî ji bo hezkiriyê xwe Welat xew ne dihat çavên wê. Hevalên Welat haya wan jê hebû.

Hadî çaxa çav li Welat kiri bû, hilfa wî çû bû ser û "Kêfa wî jê re hati bû. Baş bûn û rastbûna Welat di ruwê wî re xuya dikir.

Welat li cem bavê xwe rûniştî bû, her car çavên wî û çavên Hadî diketin hev û carna >H%^iwikayî dikeniyên.



vat tev ketibûn nava axavtinê û diaxivîn.

Carekê Welat ji Hadî pirsî:

-Heval, te xwendina xwe qedand, vêca tê çi ka- rî bikî?

Hadî bi pirsê Welat kêfxweş bû.

-Rast e bira, xwendina min qediya, lê niha di- bistan hatine girtin. piştî şeş mehan ez ê mamostetiyê bikim.

-Gelek baş e, ez te pîroz dikim '

-Zor spas kekê Welat, ma gelo tu çi karî dikî?

Welat hinekî sekinî û got:

-Ma em gundiyên reben ji şivantî û gavanti pêve çi bikini Bn ne wek te lawê axan e ne dewlemend in jî, ji vê yekê em nika: wînin.

Bi van gotinan madê Ehmed axa n bû. Lê dengê xwe nekir. Hadî; jî serê xwe xist ber xwe û şerm kir.

Hevalên Welat bi van gotinan dilxweş bû-' bûn. Gundî tev li hev dinerin û dev bi ken in.

Hadî dûvre bersiva wî da:

-Rast e kekê Welat, tu rast dibê;)Î. Axa dewlemend in, sawa wan li ser we heye, axa bi dew- lemendiya xwe we ji bo xwe dixebitînin. Mal û canê we ^i we disitînin û dikin malên xwe. Hûn çi bêjin mafê we heye, ez bi xwe ;)Î li dijî axan. çêxan û bega me, ez hevalê karker û gundiyan, hevalê we me.

Bi van gotinên Hadî gundî dilxweş bûn û ecêb mayî man. Digotin"kurê axa ye û dev diavê^e axa'. '

Madê Ehmed axa ne xweş dibe û şerm dike. Serê xwe dixê ber xwe. Nikare dengê xwe; ji lawê xwe re bike. Ji ber ku li ber dilê wî pir şîrîn e.

Welat cardin devê xwe vedike. Xanê li me- zela din nema dizane bê ji kêfa re çî bike Dîbîne ku hezkiriyê wê û birayê wê bi xweşî diaxivin. Yekcarî kşfxweş dibe.

-De ka kekê Hadî, tii me re li ser welatê me biaxive, kar û kirinên axan û şşxan ji me re bêjel

Bi van pirsên Welat, Hadî pir kêfxweş dibe, ji ber ku hê hişyarî neketi bû nava gundi- yan, lê Welat hinek tişt dizanî bûn.

-Rast e, divê berê em xwe û welatê xwe nas bi kin. Sedema (ûşt- sebeb) belengaziya xwe bizani bin.

Kurdan, bav û bapîrên me, berî sala 1514 an gelek dewlet û împaratoriyetên serbixwe ava kiri bun. Ji ber êrîşên împaratoriyetên biya- nî, û ji ber eşîrtiya di nava Kurdan de, ev împaratoriyetên Kurdan ketine. Lê cardin cî bi cî Kurdan mîrîtiya xwe domandine û mêra- niya xwe bi cîhanê dane diyar kirin. Dema berê geh bi xweşî, geh bi şer, geH^iXxwîn rijan din û geh bi serîrakirin, hate heta sala 1514 an. Lê piştî vê salê dîrokê piştaxfe da Kurdan, çerxa dinê hêdî hêdî ji bo împaratoriyetên biyanî zivîrîv. Hêdî hêdî Kurd dike- tin. Sedema mezin olperestiya misilmantiyê bû. Ji ber ku, Kurd gelek caran bi ola misilmantiyê ji alî împaratoriyetên biyanî ve hatine xapandin û ji bo wan şer kirine.

Bi piranî Kurd ji alî împaratoriyetên Osraanî û Eceman(îranî) ve hatine xapandin, van herdu împaratoriyetên feodal û mêtîngeh- kar, Kurd xwe bi xwe dane kuştin û serketina şer ji bo wan, ji bo

şana wan bû. Bi vî awayî hêdî hêdî dîroka Kurdan ber bi bindestiyê ve dimeşiya.

DJ. sala 1514 di navbêra împaratoriyeîta Osmanlî û Eceman de şerek binavê "Çaldiran" ê çê bû. Ev şer li ser welatê me çê bû. Bi vî awayî welatê me ji van herdû împaratoriyeîten feodal û qolonyalîst re bû hola şer û dijmin li ser welatê me lotik avêtin.

Piştî şer, di sala 1ê39 de lihevhatinek bi navê "Qesrî şîrîn" di navbêna herdû împaratoriyeîtan de çê bû. Li gor vê lihevhatinê Kurdistan dibû du perçe, perçek ji bo Osmanlî Q yê din jî ji bo Eceman. Piştî perçe kirina welatê me, van herdû împaratoriyeîten feodal û qolonyalîst pir zînat û sîtem li ser gelen me kirin. .

Çaxa Hadî van dibêje, gundî pir dilxwe dibin û bi kêf guhdarî dikin.

Hadî berdewam dike.

-Sedemeke mezin ya ku gelê me li paş hişti- ye, hebûna ola misilmantiyê ye.

Berî ku em Kurd bi zora ço(şûr) bîn misilman kirin, hal û rewşa dîrok û civata me Kurdan gelekî xweş bû. Dijminatî di navbêra me de tune bû. Jin û mêr weke hev bûn, azadiyeke- fireh û bê tixûb di nava me Kurdan de hebû.

Lê piştî ku, Mihemedê tacir û dewlemend rabû û ji bo nav û dengê xwe misilmantî belav kir, û gelek millet kir misilman, ew azadi- ya di nava me Kurdan de rabû û winda bû. Pir toreyên me hatin pişavtin û gelek toreyên Ereban yê genî û pûç ketin nav toreyên me Kurdan. Piştî ku, misilmantî derket, gelek tiş- tên pîs derketin holê, qelen, çadira reş, la- çik, dijminahî û. h. d derketin holê. Ev tev ketin nav toreyên me Kurdan.

Piştî ku. misilmantî derket, gelek dijmina- hî kete nava Kurdan, bira bi bira dan kuştin. Kurdan ji bo ola(dîn) xwe hevdû kuştin û ji hev re bûn dijmin. Em ji hev perçe kirin hinek ji me kirin misilman, û em ji hev re kirin di imin. Lê bingeha ola Kurdan Zerdûştî ye (êzîdî9 Bi vî awayî ola gemar. em pir li paş hiş- tin, em kor kirin û nehiştin ku em çavên xwe vekin.

Çaxa Hadî van dibêje, gelek ji gundiyan serê xwe dihejînin û rastiya gotinên Hadî didin xuya kirin.

Hadi berdewam dike:

-Piştî ku welatê me kirin du perçe, hetanî sala 1923 jiyana xwe bi qiriktalî domand. Pi- sedsala-19-an û-20-de gelek rabûn li dijî dewletên serdest çê bûn. Lê pir heyf e ku. tev- de iî hatin vemirandin. weke'^êx seîd, dêrsîm, axri û. h. d. li perçê din jî gelek rabûn çê - bûn lê ew jî hatin vemirandin. wek"serîrakiri- na, Şşx mahmûd berzencî, simko, ava kir: tia koma- ra Mehabadê, çerê çardeh salî yê Mele Mistefa barzanî û. h. w. d. lê tevde hatin vemirandin û bi sed hezaran Kurdên bê tawan hatin kuştin.

Pi sala 1923 de dewletên serdeat û qolon- yalîst li hev kom bûn û ji bo kara xwe welatê me kirin çar perçş . (Tirkî, îran, iraq û sûrî)

'Van dewletên serdest û şovenîst, bi her awayî êrîş birin ser tevgêra rizgarîxwaziya gelên Kurdistanê û x\*\*na wan bê şerm û bê fedî vexwarin. Lê li hember van kar û kirinên dijrain, gelê Kurd her serê xwe hildan û tuca- rî serê xwe ji diğmin re dananîn. Iro hêjî

ergeyên leheng ni bo serbi- û azadiya gelê me xwîna ^îna gelê me û xebata me de rola axan û çêxan jî mezin e.

Axa bi zanatî û çavekiriya xwe ve, malên we ji we disitînin û dikin yê xwe. Ew gelekî kone ne, ew . li ser pişta gundiyan dewlemend dibin û dibin xwedî metik û xaltî.

Lê şêx jî, ji axa ne kêmtir in^êx jî di bin ala olî de me nezan, kor, bêhiç dihêlin nahêlin em çavên xwe vekin. Nahêlin em pêşiya. xwe bibînin.

Nahêlin era zarokên xwe bişînin dibistanan ji bo ku, em zana û xwenda nebin lê her dem şivan û gavan bimînin, hestiyên ber lingên wan bin u birizin û herin.

Edî divê hûn gundî çavên xwe vekin û wan nas bikin. divê hûn nema bi wan bîn xapan- din. Ji dê via hûn malê xwe bidin axa û çêxan hûn malê xwe bixwin, bila zarokên we bixwin.

Ma hûn jî ne rairov in? raa axa û şêx bi çend seriyan e? divê hûn ji wan netirsin. divê hûn gundî li heraber wan bi yek bin, piş- ta hev bigirin, destên xwe bidin destên hev û maf bixwazin. Ma ta kengî em ê hestiyên ber lingên axa û bega bin? ma ta kengî era ê ' kole û xularaê wan bin?

Bi van gotinan dilê Ehmed axa nerra bû. dilê wî dişewitî, wî jî gotinên lawê xwe rast didît. Wî di nava xwe de digot" ka heta niha rain çi fam kir, min bi dewlemendiya xwe çi kar kir? ez tenê bûm dijminê gundiyan. min tu zor li wan ne kiriye jî lê cardin niha kî zane bê çi ji bo min difikirin. Ma çi he- qê min li van gundiyan heye?lê tev tawana gundiyan e, ez ne axa bûm lê ez kirim axa, ez- jî naxwazim bibim axa"

Gundî piştgirtiya Hadî dikirin û digotin "gotinên wî tev rast in"

Lê hiçê Welat hem li ser gotinên Hadî ye û hem 3Î li ser Xanê ye. Xanê ji bîra wî na-

Welat pirsêk ji Hadî pirsî:

-Baş e, madem tu li dijî axa yî, va Pavê te jî dewlemend û axa ye, tu çima li dijî wî nayê?

-Ez ji bo bavê xwe jî dibê, iim, ez li dijî hemû axa û bega me, lê divê hûn gundî ya xwe bikin yek û li doza xwe bipirsin, wê çaxê hûnê mafên xwe bisitînin

Ehmed axa serê xwe rakir û got:

-Heyran, heta niha min tu zînat û zor li ne kiri ye, lê cardin jî ez maf didim we. sibê bila her gundiyekek here û ji xwe re er- deki ji yên min bigire û li ser kîsî xwe bi kar bîne. Piştî ku kurê min alîkariya we dike û ya rast dibêje, hûn bi qîma xwe ne. hûn çi (dikin bikin, ji îro pê da em tev bira- yên hev in. Ji îro pêda di nava me da axa tune ne, bila kes ji min re nebê je axa.

Gundiyan teva li çepikan xistin -Bijî kekê Ehmed bijî. . .

WS şevê teva bi kêf û xweşî şeva xwe borandin. Gundî tev bi dilekî geş çûn malên

xwe\*Lê Welat her M? hezkiriya xwe Xanê difikirî. Welat kêfa wî ji Hadî re hati bû. Wî digof'a baş dabaşa xwe ji Hadî re bêjim, dibe ku ew karibe alîkariya me bike'. '

Wê şevş Hadî û bavê xwe dur û dirêj axi- vîn, belengaziya gundiyan, baş û qenciya wan te" bi bavê xwe dan zanîn. Bavê wî jî goti- nê Hadî rast didîtin û digot"baş e'. '

Adinî rojê Ehmed erd û zeviyên xwe li gundiyan belav kir û her gundiyekek perçek erd û dexil da yê. Gundî tev ji kêfa re wex- tî bifiriyana, hevqasî ku dilxweş bû bûn û bû bûn xwedî erd û zevî. .

Mala Welat jî erd girti bûn, lê Welat her dilxemgîn bû. Hadî di Welat derdixist ku gel-\* şên(problêm) Welat hene û dilê wî şikestiyê. Diva bû Hadî wan gelşan bizanibe da ku. kari- be alîkariya Welat bike.

Ehmed ji axatî keti bû, navê axatîyê ji gundê wan rabû bû. Gundiyan nema jê re Ehmed- axa digotin. tenê digotin kekê Ehmed, ii ber ku ji wan mezintir bû. Ev bi saya sere Hadî çêbû bû. Ehmed bû bû hevalê gundiyan û yek ji wan.

Ehmed dabaşa Xanê ii Hadî re ne goti b ne goti bû ku, min Xane daye lawê Bner a-a.

Edî nav û dengê wî gundî li hemû cîhan be- lav bû. Gundên din, gundiyan din\*tev diman ecêb mayî. Digotin"çawa Ehmel axa xwe ji axatî histiyê û bûye gundî'. '

Ji gelek gundan gurdiyan malên xwe bar di- kirin û dihatin gundê mala Ehmed û ew jî di- bûn xwedî erd û zevî. Ehmed li axatiya xwe venegeriyâ, ne dixwest axatî hebe. Ji ber ku niha nava wî û gundiyan gelekî xweş bû û we- ke bira bi hev re bûn. Tev da hej hev dikirin û rûmeta hev digirtin.

Li gelek . gundên din jî, dixwestin weke wî gundî axa ji nava xwe bavêjin û bibin xwedî erd. LiOfcLrek gundan ev bi darê zorê azadiya xwe ji axa girtin û berdan axa. Li gûnden diî. jî, axa bêtir bi hêz bû û axatiya xwe ber dewam dikir.

Ev nûçe keti bû guhê Einer axa jî. Tirseke mezin keti bû nava wî. Ew ditirsiya ku, Ehmed keça xwe Xanê nema bide kurê wî. Lê Etaer axa digot"bi darê zorê mabe ez ê Xanê bikim bû ka xwe. kes nikare derewan li min bike'. '

Şevexş cardin civat li mala Hadî geriya ye. Tev de devbiken û bi kêf in. Kes nema bi navê hev ban hev dike, pê re an"kekê, an bira an jî

heval" dibê, iin û bi vî awayî rûmet û rêzdariya(qedir) hev digirin û hevdû pîçûk nakin.

got:

-Gelî gundiyan, gelî biranl madem ku di nava me de axatî nema, madem kî em tev birayên hev in, divê çaxa em tiştê bikin em tev bi hev bişwirin û ya rastîn bipeirînin.

Hûn tev dizanin ku, berî niha bi çend salan min keça xwe Xanê dabû kurê Emer axa. Lê niha ez nema zanim, gelo em bidin an em nedin? Ev bêdilî Xanê ye, divê em riyeke bibînin, Emer axa zû bi zû dev ji me bernade.

Hadî gera(dor) axavtinê girt

-Bi ya min be, madem ku fi^ştê me bi axan re nemaye, madem ku em li dijî axan e, divê em keçên xwe nedin axa. Va di gund de xort pir in, xweha min kê bixwaze. kê bike, bi kê qa- yîl bibe bila ji wî re be.

Xanê li piş" derî van gotinan guhdar dike. Baskên wê tunene^ku bifire, êdî hêdî hêdî meq seda dilê wê dilate cîh.

Gundiyan teva got:

-Heyran, hema Xanê kîjan xortî bicibîne ew bi qîma xwe ye, kes ji me nikare wê ji evîna dilê \ê veqetîne û veqetîne.

iê gundiyan tevda dizanî bûn ku, Xanê û hej hev dikan û ji hev pêve tu kesî

felat li civatê ye, dilê wî pir geş dibe. Kêfa wî pir tê, dilê wl li ser evîna xwe li xwe dixê û kurpekurpa dilê Welat e.

Hadî di Welat derdixê ku, dilxweş bû ye. Ew dixwaze daxwaza dilê Welat bizanibe.



Hadî rabû û çû mezela din ba diya xwe û xweha xwe Xanê.

Hadî ji diya xwe re got:

-Dayê. ev hewaleke Welat heye, derdekî wî heye ez nizanim bê çi ye. Bi rastî pir kêfa min ji Welat re tê, xortekî şîrîn û hêja ye.

Xanê li wir serê xwe dixê ber xwe. Diya wî her tiştî jê re dibêje. Dibêje ku, Xanê i Welat hej hev dikin û hezkiriyên hev in.

Hadî dikene, serê Xanê radikê û jê re dibê-

5e:

-Xema nexwe Xana delai, ez ê we bi di demeke kurt de.

Xanê ruwê birayê xwe maç< dike û dibêje: -Ma ka ew roj heye?. . .

Hadî vedigere nava civatê. ew êdî derdê Welat dizane.

Piştî qederekê diaxivin. Hadî gotinê digi- re û dibêje.

-Gelî heval û gundiyan, di nava me de tişteki din heye, ku divê em bi cîh bînin. îro divê em bizanibin. ku mafê her xort û keçê heye ku hevdû bicibînin, dil têkevin hev û evîndarê hev bibin. Divê meriv van evîndaran ji hev bi dur nexê, heta ji meriv bê meriv wan bigihîne hev.

îro di gundê me de du evîndar hene ku, li ser hev dişewitîn û bêyî hev nikarin tişteki bikin. Ew pir hej hev dikin, ji piçûkahî û heta niha hej hev dikin. îcar divê em wan bigihînin hev û bextewar bikin, ew mafê wan- yê mirovatiyê yê bingehîn e.

Bi van gotinên Hadî, Welat serê xwe dixê ber xwe û dizane ew li ser evîna wan dibê-

5e\*

Welat gelekî bextewar bO, wî bawer ne dikir ku wê ev rojên xweş bân.

G und i varî «jî fêm kirin ku ji Xans û Welat pêve di gund de tu evîndar tune ne.

Gundiyekî got:

-Rast e, divê em wan bigihînin hev, divê em aile wan geş bikin.

Ehmed. bavê Xanê got:

Hadî got:

-Heyran, evîndarên me yek jê xweha min Xanê ye û yê din jî birayê me Welat e. Ev herdû hej hev dikin û bêyî hev nikarin bijîn.

Welat serê xwe xist ber Ehmed rabû û got:

-Be baş e heyran, gelî ciwanmêran, hûn tev şa- hid in, piştî ku Xanê Welat hej hev dikin min jî qîza xwe Xanê da Welat û çû. . .

Tevda li çepikan xistin. Welat rabû çû des- tê Ehmed maç kir û hat cihê xwe rûnişt.

Gundiyek rabm-çû mala Welat tembûra wî anî civatê. Li s er daxwaza civatê Welat rahişt tem- bûrê û dest pê kir û qîr kir strana. Gundî tevde rabûn û destên hev girtin û govendek li dar x:'sri.

Lê haya kesî ji Xanê tune bû ku, Ji kêfa re wextî bifire. Xanê bawer ne dikir ku wê roiek weha bê û ew û hezkiriyê xwe bigihin hev u serî deynin s er balîfekê.

Wê çevê hetanî derengî şevê gundî li ber tembûra evîndar Welat govend girtin û serke- tina wan piroz kirin.

Wê çevê xew ne ket çavên herdû evîndaran. Xanê ûWelat Ji kêf û dilxweşbûna xew ne di- ket bîra wan û di çavên wan de Jîyaneke

dûr û bextewar xuya dikir. Hetanî sibê he ketî di ber çavên hev re diçûn û dih

Adinî rojê Hadî, Welat û Xanê bi# çûn bajêr, ji bo ku tevdarika bûk û z kin. Hetanî nîvro hersê xortên Kurdan ji bo bûk û zavê tiçtên pêwist û hewce standin. Piş tî ku pêwestiyên(tiçtên ku hewce ne) xwe bi- cîh kirin, Hadî. Welat bi gelek hevalên xwe nas kirin da. Gelek hevalên xwe Jî bi Welat da nas kirin. Hevalên Hadî yê rizgarîxwaz û şoreşger li bajêr pir bûn. Tevda bi hev re xwendî bûn û ji bo welatê xwe xebat kiri bûn

Welat û Xanê hetanî ber êvarî li mala he- valekî Hadî man. Li mala hevalê Hadî, Welat hînî gelek tiştan bû. Hevalî Hadî Ji Welat re pir axivî bû, jê re qala pêçraergan kiri bû Welat êdî dizanî bû bê Pêçmerge çi ne û - Ji bo çi şer dikin. Wî Jî êdî dil dikir ku bibe Pêç; ergeyek Ji yê çiyayên Kurdistanê.

Di gel evîna Xanê hêdî hêdî evîna Welat Jî li serê Welat dixist. Lê Xana çeleng Jî Ji wan gotinan bêpar ne ma bû. Wê Jî di gel hezkiriyê xwe hînî pir gotin û tiştên baş bû bû.

Ber êvarî Hadî, Welat û Xanê xatir ii Hevalên xwe xwestin û berê xwe dan gunde xwe. Her tişt standi bûn. Tenê li dar xisitina , govenda Welat û Xanê ma bû.

Wê êvarê cardin gundî li mala Hadî kom bû- bûn û civata xwe gerandi bûn. Gundî tev diaxi- vin, ji nişkg ve yekî li derî xist

teq teq tea

ye. Hat silav li civatê kir u rûnişt.

-Tu bi xêrê hatî bira -Xwedê ji we razî be -Tu li ser çavan hatî, tu çawayî bir. -Elhemdullah, ez baş im, rehetiya we dixwazim. -Tu ji ku tê û tê biçî ku bira? qey xêr e? -Elhemdullah xêr e. wele ez ji filan

gundî, 3i cem Ehîer axa têm, divê ez hinek go tin ji Eh- med axa re bêjim.

Belengazo çavên xwe li civatê digêrîne û ecêb mayî dimîne. Dibîne ku ne weke mezela axan e û tu kes bi şiklê axa di wir de tune- ye. Ehmed axa cilên gundiyan li xwe kiriye û li teniştaya wî rûniştaye, lê ew wî nas nake.

Yê biyanî dipirse -Ma ka Ehmed axa ne li vir e?

Ehmed axayê berê, li teniştaya wî dibêje:

-Tu kîjan Ehmed axayî dixwazî heyran? Ehmed axa çû û mir. Iro ji dê via wî gundî tev bûne axa. Çi dardê te hebe ji civatê re bêje. . . Di vi gundî de axa maxa ne man e.

Ew şaş dimîne -Weh. . . çawa dibe xwedê ji we razî. . bi xwedê En. - 'd axa hebû lo, xwedê rehmeta xwe lê bike ma çî zû mir, ev çawa dibe?

tev kenîn ha, ha, ha, ha ha, ha, ha, ha

-Heyran Ehmed axa ne miriye, lê ew axatiya be- rê miriye.

Li vî gundî êdî axatî tune ye, lê wekhevî he- ye, biratiya gundiyan heye, ma ev li gundê wê heye?

-Na bi xwedê tiştêkî weha li gundê me tune ye Axayê gundê me Emer axa ye, lê yê we gundî tev bûne xwedî gotin. ev tiştêkî pir baş e.

-Haa. . . te dît, me ev axatî ji nava xwe avêti- ye, niha gundî tev bûne xwedî maf, xwedî erd û weke hev in.

Tu wî mirovê teniştaya xwe nas dikî? ew Ehmed axayê berê ye ha.

Wî li teniştaya xwe nerî û got:

-Wele we gelekî baş kiriye, ev gundi we îro tev kirine xwedî maf. Berê tişteki weha tune bû, lê va ye hin bi hin tiştên nû û baş pêk tên.

Ehmed ji teniştê wî got:

-Le ka meqseda dilê xwe bê, je, tu ji bo çi hatî vir, daxwaza Emer axa çi ye?

-Heyran, Ehmed axa ez şandim. Ji min re got ku tiwê herî ji Ehmed axa re bibêjî, min qîza wî ji piçûkahî ve ji lawê xwe re xelat kiriye. Iro herdû bûne xort û gihane, bila bûka me hazir bike van rojan em ê bînin wê biguhêzin.

Ehmed

-Heyran, tişteki di destên min de ne ma ye. Ew doz ji destên min derketiye û ketiye destên gundiyan. Ez nikarim tişteki bêjim, gundî çawa bixwazin û çawa bikin hesil ew in.

Berê me neheqiyêke pir mezin kiriye. Meriv nikare ji piçûkahî de zarokan bide hev û bi-jiyana wan bilîze. Me berê ev kir. Lê niha ez poşman im, va îro qîza min mezin bû ye û bû ye xort. Ew îro bi dil e û destgirtî ye.

Em ê li gor daxwaza qîza xwe bimeşin û wê azad bikin.

Gundî tev bi hev şewirîn û dawî li ser van gotinan sekinîn:

-Bira, tî herî ji Emer axa re bî, jî ku. berî niha bi çend salan şaşî hatiye kirin. Iro qîza- me mezin bû ye û law? Bner axa naxwaze. Me ew- daye yekî din ku, ew jî hez dike. Em?rî tu nî- zan nadin axa. Bila ji lawê kî din bixwaze, îro gundiy?

dixwest di gundekî bî axa \_\_\_

wan re got:

-Baş e, ez dixwazim mala xwe binim gund? we ma hûnê destûr? bidin?ez jî dixwazim weke we xwedî maf bim û weke we bim. . .

-Baş e, tu bi dil? xwe yî, tu kijan rojê bê ci- hête li s er çavan e.

-Baş e, bi xwedê ez ê jî bibim hevalê we û di riya we de bimeşim.

Wê şev? heta derengî şev? axivîn. Pişti derengî şev? gundî çûn mal?n xwe. W? şev?

Simo li cem mala Hadî ma. Ser? sib? li hesp?- xwe siwar bû û ber? xwe da gund? Emer axa.

Welat û Xanê li benda roja govend? ne.

Ew?dî bi serbesti hevdû dibinin û b? tirs diçin mal?n 3 e- û tîn. Ew tirs û dizîtiya ber? çû bû û cil(? xwe ji serbesti û bêtirsîy?- re berda bû.

Pişti ku, Hadî t? gund. azadiyeke fireh di- keve nava gundiyan. Gundî tev weke bira ne.

Bi s er? hev sînd dixwin û b?yî hev tu tiştî nakin. Rûmet û r?zdariya hev digirin, dil? hev nthêlin û bûne yek dest. Weke h?tekî bi bin- gel t?kûz(saxlem) in û li di. îî axatîyê û kedxwariy? ne.

Ji xey Xan? û Welat, xort û keç?n gund y?n din jî b? tirs hev dibinin, dil dikevin hev û evîndar dibin. Rewş hatiye guherandin.

MER AXA

Ener axa fl kurê xwe Mis to li malê, li ben da hatina Sirao ne. Ji xwe Misto hedana wi na-be, dibêje kengî ew roj bê ku, ez û Xanê têkevin ber hev.

Roj dibe nîvro, Bner axa ji rojîne dinere ku, waye Simo berê xwe daye qesrê fl tê.

Pişti qederekê Simo hat silav li Ener axa kir fl rûnişt.

Simo hal û dabaş ji Emer axa re got. Çavên Emer axa fl kurê wî Misto weke tasan vedibfln-. Emer axa dima ecêb mayî.

-Kuro ev çawa dibe. . . çawa dibe ku Ehmed axa bibe gundî fl têkeve halê gundiyan, ev çi re^ - zîltî ye, ev çawa axayekî tirsonek derket lo.

-Bi xwedê axa, Ehmed axa li teniştî min rflniş ti bfl, cilên gundiyan 1ê û ji xwe min ew qet nas ne kir. Ya mezin gundî tev li dijî axa ne Pir ji axa aciz in.

Misto li nava mezelê diçe û tê. kufekuf 1ê ketiye:

-wehhh. . . ê v çi ye. . çawa dibêjin em qiza xwe nadin axa. . ew dergistiya min e, bi zorê mabe jî ez ê Xanê têxim ber sînga xwe. Ma ew min nas na kin. nizanin ku ez kurê Emer axa me?

Ener axa cixarê li ser cixarê dikşîne -Be baş e, sibê em ê tev herin û li rewşa wan binerin. Bila ez jî bi çavên xwe bibînim, qey ev دنیا hatiye guhertin bavo. . .

Wê roiê madê Ener axa û kurê wî Misto wek lehre bûn. Lş dilê Misto her yê xirabiyê bû. Wî digot ileh ez ê Xanê bi zorê di ber can û cesedê xwe kim.

Wê şevê ji qehran xew neket çavên wan. Emer axa li axatiya xwe û kuirê wî jî li Xanê difikirî.

Adinî roj~ 'Finer axa bi lawê xwe 0 bi çend xulamên xwe ve dan ser rê û berê xwe dan pun- dê Ehmed axayê berê ku , des tebirakê wî bû.

2m er axa bawer ne fikir ku, Ehmed axa dev ji axatiyê berdaye. aqilê wî ji vî tiştî ne dibirî.

Li gund gundî tev li binya raalan kom bû- ne. Roj xweş e, rojê tîrêjên xwe berdane ser gund. Gundî ji xwe re ketine nav potinan û li ser her tiştî diaxivin.

Gundiyan di nav xwe de dirav kom kiri bûn da ku, adini rojê govenda Welat û Xanê li dar xin. Bi wan diravan du zirnevan û daholvan girti bûn.

Her tişt hazır kirine, kêf di ser Raza Welat û Xanê re tune, malê dinê ne dihat ber çavên wan, mirov bi malê dinê tevî jî hevqasî kşfxweş he dibû.

Hadî ji hevalên xwe yê bajêr re şandibû ku, divê bî govenda xweha wî. Wan jî haziriya xwe dikirin da ku, sibê herin nav gundiyan û hevalên xwe bibînin. Hevalên Xanê dihatin dora wê, haziriya wê dikirin, dilê wê xweştir dikirin û hêvî dikirin da ku, ew ji weke hevala xwe Xanê bi xweşî bigihin hezkiriyên xwe.

Gundiyan li bin tîrêjên rojê de xwe dirêj kirine û diaxivin. Carekê ji dûr ve dîtin ku wa çend mirovên xwedî hesp berê xwe dane gund û tîn. Kes ji cihê xwe rane bû û neçû pêçî ya wan. Tev li benda hatina wan man.

Piştî qederekê Emer axa, kurê xwe û bi xu- lamên xwe ve batin nav koma gundiyan. .

-Selamûaleykum

-Aleykumeselam, we rehmê Allahî berekatû -Hun bi xêrê hatin heyranj -Xwedê ji we razî be -Hûn ji ku tîn û diçin ku, we xêr e?

Tevde hatin li nav gundiyan rûniştin.



-Wele em ji gundê xwe tîn, me dixwest Ehmed' axa bibinin, binek karê me pê h(

Gundî tev kenîn ha, ha, ha, ha, ha ha, ha, ha, ha

-hahô haho. . . Ehmed axayê çi heyran. Ev ne gun dê Ehmed axa ye, ev gundê gundiyan e. Tu axa ai vî gundî de tune ne.

-De baş e, naxwe kani Ehmed axayê berê bi kûda çû? çi bi wî hat?

Ehmed ji teniştta wî got:

-Va ez li teniştta te me, qey tu min nas nakî Emer axa?

Emer axa li teniştta xwe nerî ku, biras- tî Ehmed axa ye.

-Kuro destbirakê Ehmed, ev çi rezîltî ye? ev çi halê te ye? ka axatiya te? te navê axa herimand. Lawê te cahil e, nezan e, tu radibî bi va lawê xwe dikî û xwe ji axatî dixî. Ev ji bo me axa kêmasiyeke mezin e birakê Ehmed .

Ehmed di ber xwe de kenî û got:

-Ev ji bo me ne rezîltî ye, ev ji bo me serbi- lindî û bextewarî ye. Heta niha ez axa bûm û min malê belengazan dixwar, dinya bi dor û rêze Emer axa. dinya ji kesî re namîne. malê di- nê ji dinê re dimîne. Niha ez û gundî bira ne weke hev û azad in. Ma ji vê tiştê xweştir heye?

Hadî ji aliyê din got:

-Dem ji dema rojek heye Ener axa. Wê rojek bê wê gundî li s er serê te derbas bin û herin. Ev axatiya rehet ji kesî re namîne. Çaxa gundî bi doza xwe hesiyan û tê gihiştin, wê çaxê hûnê bibînin bê çi tê serê axa û began.

Ma heta kengî ev gundiyan belengaz ji we re dîlîtiyê bikin, raa ta kengî wê uê maf fl ji hebûnên xwe bêpar bin? hûn van gundiyan

belengaz ii bo xwe dixebitînin û bi ser de jî tişteki nadin wan û  
^ebûnên wan ji xwe re dibin. Ma ev xêra xwedl li ku heye Ener axa?  
Effler axa dengê xwe ne fikir. Tirseke mezin keti bQ nava wî, wî  
bawer kiri bû ku, wê roje- kê gundî li serê wî jî rabin û fermanê lê  
bixwînin.

Serê xulamên Emer axa jî tevlihev bû bû. wan gotinêif hadî rast  
didîtin. Di dilê xwe de digotinMger em riya xelasiyê bibînin em ê ji  
gundê Ener axa û ji axatiya wî birevin û bên bibin hevalên van  
gundiyên xwedî maf?

Misto guh nade gotinên wan. Ew çarçav dibe û çavên xwe li Xanê  
digerîne. Dixwaze Xanê bibîne û dilê xwe rehet bike.

Emer axa madê xwe ne xweş kir û got:

-Ehmed axa, serê min bi axatiya te an bi gun- diyan naêse, tu çawa  
dikî tu dizanî. Ev kar û barê te ye.

Lê me sozek daye hev, divê em wê sozê bi cîh bînin.

-Soza çî, soza me berî niha bi hefde heşdeh salâ bû. Wê çaxê me  
xeletiyek kiri bû, niha ke- ça min mezin bû ye. Wê hê lawê te ne  
dîtiye 0 pê qayîl na be. Me ew daye yekî din ku, jê hez dike. Ji lawê  
te hêjatir û çelengtir e. êdî bes serê xwe bi keça min biêçîn Emer  
axa. Tu keçên me tune ne ku, em bidin lawê te. Here keçeke din ji  
lawê xwe re bixwaze.

-Keça min Xanê;tu çî dibêjî?va Misto hatiye te bibe ji xwe re ha. ^k  
Xanê cêrê xwe datîne û dibêje:

-Misto lawê kê ye? ez tu Mistoyan nas na- kim. Ew mirov e an lawir  
e(heywan) ez nizanim. Bila herin keçên axa ji xwe re bînin, em ne  
axa ne, bila zû ji vir herin berî ku serê. wan bê şikandin '

Gundî^^v kenîn

ha, ha, ha, ha, ha ha, ha, ha, ha, ha

-Bijî Xana çavbelek bijî, bijî gula mala bijî -ÎMe tu keça kurdan e lê, ku keç hemû ne we- ke te bin ma hêjane çi. . .

Xanê cêrê xwe hilda ser milên xwe û be- rê xwe da malê. Welat bi van gotinên Xanê gelekî dilxweç bû. Tev de jî.

Ener axa û kurê xwe ji gotinên Xanê pir şerm dikin û serê xwe dixin ber xwe. Xanê şemaqeke mezin li wan xisti bû.

Misto bi madekî ne xweş got:

-De baş e, vê ji bîr nekin, we şerefa me xiste bin lingan. Ger ez vê ji we re bihêlim, bila navê min ne Mistoyê Emer axa be.

Welat ji aliyê din got:

-Hûn lawê axan tev weha ne, hûn nav di din lê dawî çaxa zor li we tê hûn ji pis jî bêziravtir dibin.

ha, ha, ha, ha ha, ha, ha, ha -Kuro we belengazê Emer axa rezîl kir lo, de dev ji wan berdî heyran

ha, ha, ha, ha, ha ha, ha, ha, ha, ha

Emer axa dibêje:

-De baş e, xwedê ji min û we re mezin e, em ê cardin hev bibînin.

Emer axa, lawê xwe û xulamên xwe rabûn li hespên xwe siwar bûn, bê xatir xwestin, berê xwe dan gundê xwe. Madê Emer axa û Misto weke jehrê bû. Lê xulamên wan di dilê xwe de bi wan dikeniyên û digotin "qenc bi we hat'. ' Heta ku, ruhili gund, kes bi kesî re ne axivî. Dilşî- kes û madê wan tirs çûn malê.

Nkê Misto dilê wî her li ser xirabiyê bû. Wî dixwest Xanê ji xwe re birevîne û têxe h\>er can û cesedê xwe. Mis to çaxa çav li Xanê kiri bû, hiş û eqil di serî de nema bû. Misto digof'ji xeynê Xanê jin li min heram in'. '

Çaxa Misto di van difikirî, kar û xisar ne dianî ber çavên xwe. Mirina xwe ne dianî ber çavên xwe. Ew tenê li bi destxistina Xanê di- fikirî.

-4 5-

Şeveke Mis to û çend zilamên xwe çêwra xwe datînin.

Şûwra wan ev e Çevêkê divê herin dor gundê mala Xanê, wê yek ji wan here agir herde zadê wan yên li ser benderan. Bi şewitîna zad wê gundî tev derke- vin û wê Xanê li malê bimîne. Wê çaxê wê herin û Xanê birevînin.

Êvar e. Gundî tev li mala Hadî civi Adinî rojê wê govenda Welat û Xanê li Kêf kêfa wan e.

Xanê li mezela din tevdarika ke, kêf di ser kêfa Xanê re tune

Wê şevê xew ne ket çavên herdû evîndaran Ma xew dikeve çavên kê, dilê wan çargopal lê- dixê. Roja wan hati bû, roja ku heşdeh salan li benda bûn hati bû, êdî wê bi dilekî xweçû geş bigihana hev û di jiyanê de bextewar bi- wa na. ♦ .

Gundiyan di nava xwe de xaniyek ji Welat û Xanê re ava kiri bûn. Xanî bi her tiçtên hewcedarî yê xemilafc^nbûn

Adinî rojê dengê zirne û daholan kete nava hewa û deng dan û govenda herdû evîndaran dan diyar kirin. Kes neçû kar û barê xwe keç û xort, pîr û kal, mêr û jin û heta bi za- rokan destên hev girtin û govend dirêj û- geş kir'n.

Welat û Xanê cilên wan yê bûk û zavatiyê li wan fl li teniştta hev rûniştî bûn. Cilên Welat şal û şapik û yê Xanê jî kiras û xef- tan bûn. Herdû evîndar hevqasî li hev diha- tin ku. meriv digot qey li cîhanê kesî weha lihevhatî peyda nabin.

Bûk û zava bi cilên xwe yê gelêrî, bêtir sipehî û lihevhatî bûn. Nexasim Xana çavbe- lek, weke stêrkekê di nava kiras û xeftanan de dibiriqand û çirûsk didan.

Govenda Welat û Xanê tam heft roj û heft şevan domand, ^i her gundî, ji her cihî xelq hati bun govenda wan. Yê ku çav li wan diket li hember çeleng bûn û şîrîn bûna wan, şaş diman û ecêb mayî diraan. Digotin"bila kes evîn- darê hev nebin ii xey van herdû çelenganV Hevqasî ku, herdû li gora hev û lihevhatî bûn.

Govenda wan bi xweşî û geşî derbas bû. Keç û xortên gund yê dilketî û evîndar, hêvî di- kirin ku, rojek bê ew îî weke Welat û Xanê bi xweşî bigihin hev u govenda xwe li dar xin û serê xwe deynin ser balîfekê.

Welat û Xanê bi dilekî xweş gihan miradê xwe û herdû bûn hevalên hev hevalên jîî ê ku, tucarî devjihev bernedin.

Li gund maleke din zêde bû bû. Mala Welat û Xanê.

Adinî rojê gundiyan teva çûn ew pîroz ki-rin, serketin ji bo wan xwestin û cardin çûn kar û barên xwe.

Welat jî weke hemû gundiyan bû bû xwedî erd û sewal, edî wê ew û Yam xwe di erd û dexla xwe de bixebitiyana û jiyana xwe bidomandana.

Welat û Xanê êdî bê xera bûn. Welat her ro, i dice karê xwe û Xanê îî karê malê dike. Car bi caran Xanê û Welat bi hev re diçin û bi hev

re tèn raalê. Evaran bi dilekî xweş diketin hembêza hev û ji xwe re kêf û henekên xwe dikir in. '

Welat dil bi tirs bû. Tirsawî ev bû ku, . Mistovê Ebier axa tişteki bîne serê Xanê. . Ji bc vêAyekê Welat rojekê çû bajêr cera hevalên xwe. Ji xwe re bi çend airûşan demançek stand. Welat demançe anî raalê û hînê Xanê kir. Her tiştên demançê şanê Xanê dan, ;ji bo ku di ro- ;jên teng de bi kêrî wan bê, û ji bo wan amade

^e"Welat hingî hei Xanê dike, bi tirs diçe ser kar û bi tirs tê. Ew ditirse ku, tişteki bê serê arama wî. (sebra wî). Lê Xanê ne ji wan jinên tirsonek e. Ew qet natirse, ^i ber ku ew di navbêra jinan û mêran de tu ferqiyê nabîne.

Ew dibêje"şêr sêr e ci iin e çi mêr e'. 'Ev go- tin ji hevalên bajê" ' \* \* 'Ä 1 \*

Mistoyê Ener axa û Içend zilamên xwe bir- yar dane, xwe pirêdane, wê şevê wê herin û Xanê birevînin

Mis to û zEyamên xwe çekên xwe avêtin mi- lên xwe, li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan gundê toala Xanê.

Evar e, weke her car gundî tev li mala Hadî civiyane û kêfa xwe dikin. Haya kesî ji tu tiştî tune ye.

%Aşxo û zilamên xwe hatine dorhêla gund. Diviya bû şêwra ku danî bûn pêk bînin. Zilamên Misto yê gundî bédilî wan bû, ev tişt baş ne didîtin. Xanê dabûn raêr û zewicî bû. Piş- tî vê, revand. ina Xanê tişteki bênamûsî bû.

Mis to rabû zilamek ii yê xwe şand ku agir bi zadên gundiyan yê 11 ser benderan xe. Zi- lamê gundî bédilî çû. Şev tarî ye. Yê gundî çû û li cem koma zad rûnişt û ii xwe re fikirî û got"ma çi xezeba xwedê li min bû ye, ev za- dê gundiyan ê salekê ye, ma çi heqê min

li wan heye ku, ez bê sedem(sebeb) rabira û b işe- witînim û wan birçî bihêlim? Keça xelkê gi- haye hezkiriyê xwe û çû ye, îcar ev çi zor e, ev çi bênamûsî ye? de bi xwedê ez destê xwe nadim tu tiştî. Ya baş ez ê herim gundiyan agehdar bikim, ez bênamûsiyê nakim, ez ne x. i- niz im ku xiniziyê li birayên xwe yên pundî û Kurd bikim'.

Misto û zilamên xwe yên din li benda hati na hevalê xwe ne.

e, ew Dî radibe diçe Hecî dikeve hundir

-Selamûaleykum ya c

Gundiyan nerîn ku yeki biyanî , ye -Aleykumesalam û rehmetulah. .  
. kerem bike biray ê ezîz.

Hecî hat li ser doçekêkê rûnişt -Tu bi xêrê hatî bira. xêr e derdê xwe bêje.

-Heyran derdê min ev e. Hal û dabaş ev e. Bi xwedê Mistoyê Emer axa û em çend gundî hatin dora gund, ew niha li benda min in. Ji min re gotin ku, here agir bi zadê wan xe ez jî ha-

|

tim. Lê heyran tu heqê min li we tune ye, ev ^îstekî bênamûsî bû. ûjdanê min nepeirand. Bi wedê niha Misto dixwaze Xanê birevîne, ew ni a li dora gund û li ber filan latê ne.

-Haa. . . mala te sed carî ava be birayê hêja. Bi rastî te baş kiriye. Te qencî û başbûna xwe li vir da diyar kirin, em spasdar in.

Ew Ji xwe re diaxivin, lê Xanê li aliyê din her tiştî guhdar dike a dibihîze. Xanê radibe bêyî wan diçe malê, demançê dixê ber xwe û be- rê xwe dide cihê Misto. Şev tarî ye lê Xanê tu xeman naxwe û natirse.

Gundî radibin xwe kar dikin, rext Û tifi gên xwe diavêjin stuyê xwe  
û dikin herin s Mistoyê dilxirab. Di wê navbêrê de Welat di îe:

-Kuro kanî Xanê li ku ye? bila ew li mal ha!

-Xanê. . Xanê. . ka tu li kuyî?

-Kuro niha derkete der. Ez nizanim bê bi ku de

çu. .

Welat diçe li malê dinere lê ne li mal e jî. Tirseke mezin dikeve dilê  
Welat. Cardin ve- digere nav gundiyan.

Hê gundî di nava wan fikir û gomanan de, ji niçkê ve li pişta gund  
dengê teqîna deman- çan hat

Teq teq teq Teq teq teq

Gundiyan dan lez

-Kuro zû bibezin. bi xwedê ev tişteq qewimî -Zû divê em wana  
bigirin -Kuro Misto sax ne lêlin lê destên xwe nedin gundiyan din  
ha. .

-Kuro ev axa bûn bela li serê me, em herin ku ji me re dibin asteng.  
em ê niha şanî wan bidin bê em Kurd çî tînin serê wan.

Xort^Si mêrên gund rahiştin tifiingên xwe û berê xwe dan cihê ku,  
dengê demançe jê hat.

Jin, keç û zarokan jî her yekî rahişt dare- kî û fanosan û wan jî dan  
dû mêran û beziyan.

Haya kesî ji Xanê tune ye. Nizanin ku xwedi- yê demançe Xana  
leheng e, nizanin ku demançe bi tiliyên Xanê hâtive texandin.

Gundî ha li vir, ha li wir, dawî xwe gihan- din xwediye demançe.  
Çaxa gihan wir dîtin ku çî bibînin.



Va Mis to li erdê vezilandiye û di nava xwî- nê de ye. Xanê jî demençe di destan de û li ser serê Misto sekinî ye. Zilamên Misto jî çe- kên xwe danîne û rûniştine.

Welat bi xar çû Xana xwe maç kir û got:

-Bijî delala rain, ez dizanim di cîhanê de tenê sebra dilê rain î.

Xanê:

-Xema nexwe Welatê min, tu kes nika: xwe bavê je namûsa me, êdî bila dilê

Gundî tev li Xanê man ecêb mayî.

-Bijî Xana hê ja bijî. Bi xwedê tu lehenga Kurdan î .

Xanê :

-De bila Misto bixwe êdîtqey naraûsa me jê re berdayî bû? ev axa namûsa hemû kesî ji xwe re berdayî dihesibînin. Çavên xwe berdidin namûsa hemû kesî. De \*car bila bizanibin ku em weke wan ne bênamûs û bêşeref in.

-Keçê bi xwedê Xanê gula mala ye. Hema tu her- dû çavên min bî lê, wele te qenc û rind kir. Qey ava reş bi çavên wan de hati bû? Qey namûsa me ji xwe re li ser sergoyan dîti bû.? Ev çi bêxîret û bênamûs in. Heqe van mirovên bênamûs e ku, meriv yekî ji wan sax nehêle.

Keç û jin jî ecêb mayî ma bûn

Çiteçê Xanê çawa ew kuşt? bê Xanê , çiqasî bi ceger e qirikê.

-Qenc û baş kir, bi xwedê ew ji me teva mêr- tir û bi cegertir e.

-Rebenê, divê jinên Kurdan hemû weke Xanê bin Ev mêrên bênamûs divên bi destên jinan bîn kuştin.

Wê çevê gundî cardin çûn mala Hadî. Gundiyên Mis to jî bi wan re çûn mala Hadî. Tu tişt bi wan ne hati bû kirin.

-Heyran bi xwedê qeûc û baş kir, qenc û baş bi wî hat. Misto pir bênamûs bû, em bi xwe jî bi zorê bi xwe re anîn. Bi saya serê Xanê em jî je xelas bûn.

-Heyran bi sûnda mezin, heqê van axan e ku, meri v pêl serê tevan ke. Hingî dewlemend in, çav- sor dibin û çavên xwe berdidin namûsa me ku- ro, ev çi bê xîret û şeref in lo. . .

Gundiyên Elmer axa dilê xwe nerm kirin

-Kuro bi tirba bavê min. ez nema serê xwe ji Emer axa re ditewînim. Ma xune beta kengî em ê dîlîtiya wî bikin? Bi sûnda mezin ji nûv- re ew bêje yek ez ê bêjim deh. Ma xune xwelî bi serê me de rijiya ve? qey em ne mêr in, qey em ne Kurd in kuro?

roj berî rojê jê xelas bibin û ji nava xwe rakin. Divê keda destên xwe hûn bixwin, ne axa û beg. Divê hûn jî weke me bibin xwedî maf. Ger hûn serê xwe ranekin, hûn ê tim di vî ha- lî de bin û belengaz bin.

-Na bi xwedê tu çara me nema. Sibe dusibe wê dest bavêjin namûsa me jî, divê zû bi zû em Emer axa ji nava xwe biqewirînin. Ev rewş weha nameşe heyran. ma xune bi derewan e. ev li

ber çavan e.

Wê çevê gundî tev li ser namûs û bê na- mûsiyê axivîn.

Lê Xanê êdî keti bû devê her kesî. Her kes li Xana leheng ma bûn ecêb mayî. Rûmet û rêzdariya Xanê roj bi roj di nava gundiyan de zêdetir û pirtir di bû.

Di gund de heta niha ne hati bû bihîstin ku jinekê mêrek kuştiye. Lê Xanê ev mêranî kiri bû û rê şanî jinan da bû. Jinên gund êdî weke berê ii mêran ne ditirsiyan.

Welat êdî bê tirs bû. Tirs a wî ya raezin Mis to bû, lê Mis to jî bi destên Xana wî hate kuştin. Edî di riya Xanê de tu kes ne ma bû Dilê herdû Kurdan rehet û geş bûn.

Kuştina Misto ya bi destên Xanê, ji bo p deçûna ^inan di gund de bû pêngaveke mezin Piştî ku, ev bûyerê belav bû û hat bihîstin, ê- dî mirovên bê namûs û tolaz ne diwêrî bûn weke berê çavên xwe berdin jinên xelkê û xwe ji wan bi dur dixistin. Jinan jî êdî Xanê ji xwe re kiri bûn rêber û di riya wê de dimeşî- yan.

Ev pûşveçûneke pir mezin bû. Vê bûyerê da diyar kirin ku, jin jî weke mêran mên in û karin her tiştî bikin û bi cîh bînin.

Adinî rojê laçê Misto li ser hespê kirin û bi gundiyên wî re şandin bi ser bavê wî Emer axa de.

finer axa çaxa çav li laş lawê xwe kir, bi hêz ket. Laşû Misto di nava xwînê de bû. Gun- dî dilxweş bûn, ji ber ku, Misto ji bo bê namûsîyê çû bû, û heqê xwe standi bû.

finer axa çav bi hêstir û got:

-Kê lawê min kuşt? we çima hişt ku ew bê kuştin?

-Lawê te Xanê kuşt. Lawê te ji bo namûsa xelkê çû bû. Va wî jî derba xwe dît. Ma qey namûsa xelkê li ber we berdayî ye? ev çi bênamûsîyê ye? ev çi pîsîyê ye? qenc û xweş bi la- . wê te hat, ma heta kengî wê li dor jinên xelkê bigeriya?

-De baş e lawo, hûn jî îro li serê min radibin lawê min bi we re bû, we ji qazî ve kuştiye.

-fin ne bênamûs in Emer axa. Çavê me di namûsa xelkê de tune ye. Mirovên bênamûs em serê xwe pê naêçînin. Ji îro pê de em nema te nas dikinim êdî axatiya bi bênamûs î na pejirînin. fin êdî axa maxa naxwazin.

-Rast e, divê di hundirê heftakê de tu gundê me terk bikî, an em te sax nahêlin.

-Heta niha me koletiya te kir, êdî bes e. Din- ya bi dor û rêz CTJî îro pê de evqase erd zevî, çiya û gund tev yên me ne, yên gundiyan e. Tu tiştêkî te tê de tune ye, divê tu gavên xwe li gorî xwe biavêjî.

^^^S^axa hêstirên wî dihatin xwarê. Tir- sa wî hati bû serê wî. Edî wî nema dikarî bû axatiyê bike. Her tişt ji destên wî derketi- bur. Kes li piştta wî ne ma bû. Diviya bû gund terk bike û terk û dinya bibe.

Weke hemû axan, dawiya wî jî hati bû. êdî ew dem û dewranên berê yên axatiyê û xweş wê tenê di xewnên xwe de bidîta.

Adinî rojê Emer axa gora] awê xwe bi destên xwe kola û ew tê de veşart. Kesî alîkariya wî ne kir.

Emer axa di hundirê heftakê de, rojekê li hespê xwe siwar bû û terk û dinya bû. Ji wê rojê ve tu kesî deng û pêjina wî ne kir.

Gundiyan, erd, dexl, zevî, rez û hebûnên din li hev parvekirin û hebûnên xwe xistin bin ger û destên xwe û ji xwe re bi kar anîn. Wan 3î weke gundê din alîkariya hev dikirin û bê- yî hev tiştêk ne dikirin.

Car bi caran gundî tev, ji gundekî diçûn gundê din û şevbihêrka xwe dikirin. Di nav her- dû gundan de girêdanek germ pêk hati bû.

Bi vî awayî nav û dengê Xana leheng belav bû û ji gundekî çû gundê din. Qaxa nav û dengê xanê dihate bihîstin. di nava xelkê de dibû

hesret ku, Xanê bibînin. Çaxa nav û dengê Xanê dihate bihîstin, xelkê dizanî bû ku, ev jinmêr e, bi namûs e û berberî hezar mêrê pîs- e' Ji xwe keç û jin bêtir hej Xanê dikirin. Ji ber ku Xanê rê ji wan re vekiri bû ku, ew jî bikaribin mirovên pîs. mirovên xiniz û mirovên bênamûs bikujin.

fidî jinan ji Xanê fêre digirtin, wan jî dix- westin weke Xanê mêr bin û leheng bin. Wan di- got"divê em rê nedin mirovên xiniz(xayîn) û tolaz. Divê em tucarî bênamûsiyê ne pejirinin û em nekin jîV

Ji xwe^mêran Xanê mêr dipejirandin. Digotin divê jinên gund tev weke Xanê bin û weke mê- ran b in. Divê jin ji dîlîtiya mêran derkevin û weke toreyên Kurdan yên kevin, azad û serbest Slin.

Bi vî awayî hêdî hêdî azadiyeke bê tixûb dikete nava mêr û jinên gund û rêdana(izin) wan ya axavtinê hebû.

### ŞER ŞER E ÇI JIN E ÇI

Di ser wan re demeke dirêj jekê çend hevalên Welat û têne gund. Ji ber ku. raala H e, tevde diçin mala wan kşfxweş dibin.

Evarî gundî dibîhîzin ku, mirovin bi navê P^şmerge hatine gund. Gundî tev berê xwe di-din mala Hadî.

Gundî xêrhatinê IJ^/an didin û rûdinin. Gundî pir kêfa wa^ji wan re tê. her yekê rex- tek li pişta wî, demançek di ber wan de û ke- leşkofek libber wan e.

Evarî gundî tev tîn cem wan û bi dîtina wan kêfxweş dibin. Xanê û jinên din jî li nava mêran rûniştine û weke mêran in.

Gotinek ji vir û yek ji wir, dabaş vedibe.

Hadî ji yekî dipirse:

-ê kekê Şepal'. rewşa hevalan çawan e? hê şe- rê xwe dikin?



Yekî ji pŞşmergan armanca xwe got û dest- pê kir:

-Gelî bira, weke ku em tev dizanin welatê me Kurdistan îro di bin nîrên qolonyalîzmê de û di bin nîrên feodalîzmê de dinale. Gelê me ji hebûnên xwe û ji mafên mirovatiyê mehrûm û bê par in. Ji alî dijmin bi zanatî nezan û li paş hatine hiştin. Iro li hember dijmin, li hember qirkirinên wan yên ne mirovtî, pêşmergeyên me yên leheng(qehreman) serê xwe li hember dijmin rakirine û ji bo serbixwebûna welatê me tê dikoşin û şer dikin. Ev serxwegirtiya (wezîfe) me Kurdan tevan e ku, li ser rêçeke rast ji bo welatê xwe şer bikin û dijmin ji wela- tê xwe biqewirînin.

Îro PŞşmergeyên me yên rizgarîxwazTgelek derbê giran li dijmin dixin û birînên bê derman di laşê dijmin de vedikin. Ji ber ku, pŞş-mergeyên me yên leheng ev demeke dirêî e ku, şer dikin, pir westiyar e. Dj-ÿî hinek peşmerge- yên nû têkevin şûna wan hetanî ku, pêşmerge yên westiyayî bêhna xwe berdin û bi ser xwe bînin.

Piştî ku, Pêşmergeyên me bi ser xwe bînin, î- car yên nû bi qîma^lwe ne, ger bixwazin dika- rin vegerin malên xwe. Ger bixwazin jî dika- rin bi birayên xwe re şe^ dijmin bikin.

Daxwaziya me e\ e, îcar em nizanin bê hûn- ê çi bêjin û ramana we çi ye?

Welat ji eliyê din got:

-Hevalnoî ev serxwegirtiya me tevan e. Divê em birayên xwe yên pêşmerge bi tenê nehêlin.

Div'> li gor hêza xwe em herin û piştî bira- . yên xwe qewîntir bikin. Ew ji bo azadiya me û ji bo rizariya welatê me şer dikin û xwîna xî\*; dirijînin. Bê şer û tekoşîh em nagihên armanca û daxwaziya xwe ya bingehîn. Divê bi çi- awayî be em alîkariya birayên xwe bikin.

Ez bi xwe araade me. Ez bi we re tēm û bila ez di ber welatê xwe de û bi serbilindî gorî- bibim. Ma tiştêk ji vê xweştir heye? Iro birayên me şerş gelerî didin, çaxa em li malên xwe rûnin û li wan temaşe bikin. Ji me re ge- lekî şerm e.

Xanê ji nava 3inan got:

-Ma destûra jinan heye ku, baxivin?

-Çawa tune ye xweha min? destûra jinan ya mêran heye. Em tu ferqiyê naxin nava \_ û mêran. Azadiya jinan ji bo me û ji bo tore- ya me gelekî pêwist e.

-Baş e, madem ku. destûr heye ku (foaxivin û jin û mêr weke hev in, wê çaxê serxwegirtiya mêran serxwegirtiya me jinan e jî.

Divê em jin jî milşn xwe bidin milên mêmên rizgarîxwaz, welatparêz û şoreşger. Divê em ji weke pşşmergeyşn leheng xwe ji bo serbixwebû- na Kurdistanê bavê jin qada şer.

Weke ku, bav û kalên me gotine "Şş çêr e çî jin e çî mêm e" Divê tu ferqî nekeve navbêra jin û mêmên. "\*Ji ber ku. şoreş bê jin nabe. Divê di şoreşê de rûmet û rêzdariya jinan pir be. Rola jinan di pêkhatina şoreşê de gelekî me- zin û gelekî jî giring e.

Ez bi xwe di gel hevalê xwe Welat, em ji bo çerê serbixwebûnê amade ne. Bn bi can û bi mal bi birayên xwe yên pêçmerge re ne.

Xanê bi van gotinên xwe, dilê tevda geş kir. Grundiyên tevda êdî biryar dan ku, herin û bibin pêşmergeyên çiyayên Kurdistanê rengîn.

Çend keçên din jî biryar girtin ku, weke Xanê û bi Xanê re herin alîkariya birayên xwe bikin. Wan jî dixwestin weke xwehên



xwe" Leyla Qasim û şello(Margrêt) û hezarên din ji bo welatê xwe bèn gorî kirin û bidin riya wan.

Gundî tev dilxweş bûn. Ji ber ku wê ji bo serbixwebûna welatê xwe û li heraber dijmin şer kiribiwa na, ji ber ku, wê alîkariya bira- yên xwe yên pêşmerge ku, bi salan li serê çî- vavên Kurdistana rengîn bi dijmin re şer di- kirin»kiribiwa na. -

Adinî rojê Hadî, Welat û pêşmerge tev çûn gundê ku berê di destê Ener axa de bû. Gundî bi hatina wan pir dilxweş bû bûn. Dabaşa xwe ji wan re jî gotin û dan zanîn. Xortên gund gava biryar dan ku, ew jî herin alîkariya xwe.

Ji herdû gundan qederê sed xort amade qederê deh qîzên leheng jî bi wan re bûn. Xa- nê jî tev li wan e.

Di hundirê heftakê de pêşmergeyên nû xwe kar kirin, cilên xwe li xwe kirin, çek û tîfin- yên xwe avêtin milên xwe, xwarin û tiştên hew- cedariyê bi xwe re birin û bi serbilindî berê xwe dan hevalên xwe yên pêşmerge ku, li ser çiyayên Kurdistana rengîn bûn.

Xanê û hevalên xwe yên keç. xwe gelekî baş girêda bûn. Weke hemiyar wan jî destmalên belek belekî li serê xwe pêça bûn, rextên dagir- tî li bejina xwe ya zirav şidandi bûn, tîfing- ên xwe danî bûn ser milên xwe û li pêqîya wan dimeşîyan.

Çaxa pêşmergeyan ev keçên Kurdan yên leheng di nava xwe de didîtin, bêtir dilxweş, kêfxweş û serbilind di bûn. Nexasim keça Kurd ya leheng û çeleng Xanê, bêtir dilê hevalên xwe qe- wîn û bi bawertir dikir.

Lê Welat ji hemiyar bêtir serbilind bû. Ji ber ku, Xana wî ya çavbelek bi wî re bû, êdî çî bibiwa ne xema wî bû. Ji ber ku wê wî û Xa- na

xwe bi hevre şerê dijmin kiribiwa na. Bi kuştin û hiştin wê bi hevre biwa na.

Tev bi çûyina çerê gelêrî yê welatê xwe ge- lekî serbilind bûn. Pêçmergeyan teva dabûn dû hev û ber bi hevalên xwe yên parêzger û xwîn- rêj ve dimeşyan.

Li s er çiyayê qederê rojekê meşyan. Carna digihan çiyana ku. meriv digot qey rê bi wan nakeve. Hevqasî ku, bilind û asê bûn. Lê pêçmergan ev çiya qui bi qui dizanîn. Dizanîn bê riya xelasiyê li ku ye û çawa ji wan cihên asê û bilind xelas dibin. Ji ber ku cîh û warê pê mergan ev çiyayên bilind û asê bûn, ciyê parê- ziyê ev çiya bûn.

Pêçmergeyên leheng gelek caran di van çiyayên bilind û asê de zora dijminê xwe birine û birînên bê derman di laçê dijmin de vekirine. Bilindbûn û asêbûna van çiyayên bi heybet tirseke mezin dixist dilê dijmin. Ew dilerizand- in. Ji ber ku, di van çiyayên de pêçmergeyên Kurd çêr û pilingên Kurdan cîh girti bûn. Ji van çiyayên agirê sor bi ser dijmin de dihate baran- din. Ev çiyayên bilind weke hêlîna mozên sor

didin û vedana wanljoê derman e. Ev mozên sor bê guman e ku»pêçmergeyên Kurd Û Kurdistan in.

Pêşmergeyên ku, li çiyê bûn, carekê ji dûr ' ve nerîn û dîtî ku va qederê sed pêşmergeyî berê xwe dane aliyê wan û ber bi wan ve tîn.

Rabûn tevda mizgînî dan hev. Tev derketin pêşiya wan. Piştî qederekê tev gihan hev, tev çûn dest û rûyên hev û xêrhatin li hev dan.

Tev çûn cîhekî xweş li hev kom bûn û rûniştin. Lê pêçmergeyên çiyê li tiştêkî mabûn ecêbmayî. Ji aliyê din jî gelekî serbilind bûn. Ew ecêb mayîn dîtina keçên Kurdah di nav pêstraer-geyan de bû.

-Ê, gelî bira, hûn tev bi xêrê hatin qada çerê serbixwebûnê.

-Zor sipas, zor sipas gelî hevalan. Bila çerê serbixwebûnê ji bo me serketin be.

-Ma hûn wesitiyan e? yê ku westiya be bila here xwe dirêj bike û rakeve.

-Na heval na, westîn ji me re şerm e. Ger em di meşa rojekê de biwestin, em ê çawa bi meh û salan çerê dijmin bikin? Pivê westîn ji bo me tune be.

-Pir rast e, pir rast e. Divê westîn ji me pêş-mergan re tune be.

-Gelo ev xwîçkên me kî ne? hatina wan ji bo

\_\_\_\_\_ anê ye û hevala heval Welat

e. Ev keçên din jî xwîçkên me ne û ji gund bi me re hatine da ku, alîkariya we bikin.

-Pir baş e, pir baş e. Birastî şoreş bê jin na-be. Divê jin jî weke mêran xwe bavê jin qada şer. Ma ne rast e xweha Xanê?

Xanê:

-Rast e bira rast e^erê welat ji bo me jinan jî serxwegirtiyeke pir mezin e.

Hebûna jinan di şer an di şoreşekê de gelekî giving e. Hê "Leyla Qasira-Şello (Margret)" ji bîra me ne çûne birayên delai. Ma em ji wan çêtir in? na, ew ji me çêtir bûn ku, xw« ji bo welatê xwe bi mêranî gorî kirin. Ala \_\_\_\_\_ wan hilda bû divê îro li ser milên keç 0 ji-nên Kurdistanê bê hildan û li ser milên wan pêl bide.

-Bijî xwîşka delai bijî. Tu gelekî rast dibê- jî. Ez hêvî û bawer dikim ku, di pêçerojê de wê keç û jinên gelên Kurdistanê tev weke we leheng û dilxwaz bibin. Hûn ê ji wan re bibin nîşan.

Divê keç û xortên Kurdan bîr û baweriya xwe bi temamî bi doza xwe bînin. divê baş zana bin û bizanibin bê ji bo çî şer dikin û armanca wan ya bingehîn çî ye.

Ev şer ji bo xelasiya me teva ye. Çî jin, çî mêr, çî kal û çî zarok, divê tev milên xwe bidin milên hev û bi yekîtiyek xurt û bê tixûb xwe bavêjin qada şerî. Di vî şerî de ya giring- tir ev e ku, em dost û dijminên xwe baş bina- sin û li gor wê em gavên xwe bavêjin"\* Bav Ê kalên me ji ber ku, dost û dijminên xwe nas ne kirin, gelek caran hatin xapandin û şoreşa wan bi bin ket. Divê em ji dema çûyî fêran bis- tînin. Ya herî giring jî ev e ku. divê şoreşa- me di bin ala partiyeke pêçverû û şoreşger de bimeşe Q bi ilmekî zanistî divê pêçiya xwe bibîne. Ger ne weha be, weke gelek caran em ê têkevin koncal û nava teqanê.

-Rast e bira rast e. Ger em ji dema çûyî fêran nestînin, em dê nikaribin pêçiya xwe ronî bikin û tê de pêngavên mezin bavêjin.

-De baş ehevalnoi em îşev razên, sibê em ê hevalên çûnê bişînin mal û wê hevalên nû tê- kevin şuna wan.

-Baş e, baş e. De hevalno şeva we bimîne xweş. -Ya we teva jî birano.

Adinî rojê pêçmergeyên nû xwe kar kirin Hevalên wan kemînên ku, li hember dijmin bise-kinin şanî wan dan.

Welat û Xanê; jî di kemînekê de û bi hev- re disekinîn. Hadî jî li ser pêçmergeyan dige- riya û dilê wan xweş dikir.

Pêçmergan cîhên xwe, çek û topên xwe tev bi cîh kirin, tu kêmasiya wan ne ma bû. Pêçmer geyên berê/xwe kar kirin, xatir ji hevalên xwe xwestin û bi destûra mehekê çûn nav zar û zê- çên xwe. Hevalên wan ji wan re goti bûn ku, di- vê di roja xwe de hûn li vir amade bin. Wan daxwaza hevalên xwe pejirandin. Wan bi kêf-xweşî berê xwe dan malê. Ji zûv de neçûbûn mâl. Lê îcar mehekê destûra wan hebû, wê têr ku lên dilê xwe birijandana.

Di nava pêşmergan de gelek jin û keçên gundî jî hebûn. Wan ji pûşraergan re xwarin çê- dikirin û cilên wan dişûştin. Gelek caran wan jî bi pêşmergan re li dijî dijmin şer diki- rin û rê li dijmin teng dikirin.

Xanê jî alîkariya çêkirina xwarinê û cil- şûştinê bi jinan re dikir. Lê Xanê wextê xwe yê pir di nav pêçmergan de derbas dikir û ji wan hînî gelek tiştan dibû. Xanê bi alîkariya hevalan, pir nîşangir û şerker bû bû. Keçên Kurdan yên din jî xwe hînî nîçanê û şer kirinê dikirin. Ev ji bo wan pêçveçûnek mezin- bû.

Welat di kemîna xwe de û çavnêriya di, imin dike. Xanê car bi caran ji kemînê derdiket û diçû li rewşa hevalên xwe yên din dipirsî. Welat carna gelekî ditirsiya. Ew tirs ne tir- sa dijmin lê tirs Xanê bû. Wî digot qey wê tişteyê bê serê Xanê. Xanê tirs dilê hezkiri- yê xwe dizanî bû, ji wê yekê ew bi tenê ne di hişt û dilê wî xweş dikir.

Çiyayên ku pêçmerge tê de, ji bo nêçîrê ge lekî dest dayî bû, gelekî xweş bû. Tê de her texlît lawir(heywan-teba) hebûn. Pêçmergan ge- lek caran xwarina xwe ni nêçîrê derdixistin. Gelek caran Kew, sûsk, kîroşk an Xezal dikuştin û ji xwe re li ser agir dibirajtin.

Xanê jî ji vê nêçîrê bêpar ne dima. Dilê wê pir hebû ku, biçe nêçîrê. Kêfa wê gelek; ji nê-çîrê re dihat.

Hevalên Xanê yên pêçmerge, ne dixwestin dilê wê bihêlin. Ji wê yekê destûra wê didan ku, here nêçîr ê. Lê ne dihiştin ji Vtixûbên xwe der- bas bibe. Ji ber ku, hê gelek çiya di destên dijmin de bûn. Ji wê^rekê kes ji tixûb derbas ne dibû.

Xanê her cara ku, diçû nêçîrê, destevala ne dihat bi ser hevalên xwe de. Çi cara ku diçû, an çend kew, an çend kêroşk an jî lawireke din yê xwarinê bi xwe re tanî.

Lê çavê Xanê tenê ne di nêçîra lawiran de bû. Her weha çavên wê li nêçîra dijmin jî bû. Çaxa ew diçû ber tixûbên xwe û yê dijmin, wê çavên xwe li rêçekê hêsanî digerand da ku, pê bikaribe êrîçî dijmin bike. Xanê her dixwest ku tolê ji dijmin bistîne. Bi tenê nikarî bû tola gelean bistîne, lê wê digof'ez ê bi des- tîn xwe çend dijminan bikujim" da ku dilê wê rehet be.

Xanê her sûnd xwarî bû. Wê di dilê xwe de digot:"hetanî ku. ez çena dijminan ne kujiro

ez venagerim malê. An ez ê bêm kuştin an jî divê ez tolê bistînim'.

Di serê Xanê de tenê ev raman hebû.

Rojê wan derbas dibûn. Heta wê çaxê (wê rojê) tu îrîş ne kiri bûn û tu jî ne dîti bûn.

Pêçmergeyên leheng rojekê li hev civiyan.

Wan biryar girtin ku, şevê Srîşek^ bibin ser wargeha(kamp) di 3 min.

Li aliyê din, leşgerşn dijmin pir westiya ne. Ji tirsan xew nakeve çavên wan, tevde ser gêj û sist in. Serleşger^ dijmin di mezela xwe de kêfa xwe dike. Ew serê xwe bi leşger^n xwe- naşşîne, ten 5

fermanê dide wan. Leşger hingî bê xew û bê hal in, ji serleşgerS xwe pir aciz bûne, ew dixwazin roj berî rojê 3i vî halî xê - las bibin.

PSşmergeySn Kurd xwe 3i bo êrîşê kar kirin. Tevde weke şêran bê tirs bûn. Çavên wan weke piringên agir dibiriqandin, dilê wan qewîn û govend lê dixist.

Wan cihê ku, serleşgerê dijmin lê dima di- zanî bûn. Diviya bû vê carê derbeke pir mezin li dijmin xin. Tevde kar kirî û li benda şeva tarî bûn.

Xanê û Welat jî xwe pir baş şidandi bûn. Welat pir ji Xanê ditirsiya ku. tiştêk bê se- rê wê. Lê Xanê tirs ne diket dilê wê. Wê her tişt dabû ber-çavên xwe, diviya bû çend leşge- rên dijmin bikuje da ku, tolê bistîne û dilê xwe hênika<sup>i</sup> e.

Leşgerên dijmin weke her car bê hal û wes-tiya ne. Haya wan ji tu tiştî tune ye. Tev sist û sergêj di kemînên xwe de ne.

Serleşgerê dijmin wê şevê pir vexwariye. Jinek jî ji bajêr aniye û kêfa xwe dike. Wî di ber jinikê de her tişt ji bîr kiriye, haya wî ji tu tiştî tune ye.

Hêdî hêdî roj diçe ava û dinya dikeve nava tariya şevê. Her ku dinya tarî dibe, dilê leş- gerên diimin tiie tirs dibe. Lê ji bo pêsmer- gevên Kurdan weke hev e. Çi roj be û çi jî şev be, tu ferqî nakeve navê.

Pêşmergeyên Kurdan, ji leşgerên di imin bê tir şidiyayî û bêtir bi hêz bûn. Bindestbûna welatê wan Kurdistan, talankirina dewlemendi yên welatê wan yên ser erdîn û bin erdîn, nî- jadperestiya ku li ser gelê wan dihate kirin qirkirinên ku, bi sed salan li ser gelê Kurd hati bûn û dihatin kirin, evqas bûyêr dihatin ber çavên wan û dilê wan li dijî dijrain<sup>i</sup> jî kîn dibû û rikdar dibûn. Evqas bûyêrên ku hati bûn

serê gelê Kurd yê bê tawan, evqas zînat û zora ne mirovtî, bêtir ew davêtin qada şer bêtir ew hartir û qewîntir dikirin.

Dilê teva govend lê dixisî . Digotin kengî era êrîş bikin ser dijrnin û tola xwe ii wan hilînin. Lê hêdî hêdî roj diçû ava û daxwaza wan dihate cîh û rê ji wan ire vedikir.

Roj çûbû ava. tariya şevê xwe berda bû ser çivayên Kurdistan<sup>^</sup>. PSşmergeySn Kurd li hev civiyan. Diviya bû her kes serxwegirtiya xwe bi cîh bine.

Pêçmergeyên leheng cihê dijmin bi hev dan nas kirin û pûşmerge bûn çar şiq. Her şiqek çû aliyekî dijmin. Pêçmergeyan di nava xwe de çêwrek danî bûn. Li gor wê çêwrê, diviya bû pêçmergeyên şiqû yekemin dest bi gulebararidi- nê bikin. Pişti ku, çiqê yekemin dest bi şer kir, wê dijmin hêza xwe bide aliyê şiqû yeke mîn. Dûvre wê şiqş dudo, sisê û çaran 3i paş ve şrîş bikin ser dijmin.

Li ser vê çêwrê. her çar şiq belav bûn û he şiqekî çû kemîna xwe.

Xanê û Welat îî di çiqê çaremin de bûn. Xanê demançe di ber de, rext li piştû û xencerek îî xisti bû ber gora xwe ya lingê rast ê. Xanê pir fireh difikirî. Wê digof'hema çi dibe çi nabe, dibe ku, ev xencer ji pêwist be'. '

Dinya şev e û tari ye. P<sup>^</sup>şmergeûn her çar şiqî hêdî hêdî xwe nêzîkî dijmin dikin. Hawîr- dorê dijmin bi pêçmergeyên Kurdan ve hate girtin. Tevde li doK<sup>^</sup>dijmin bûne xelek. Çûk bi çûkaniya xwe nikare xwe ji nav wan xelas bike. Hevqasî kku pûşmergan tevdîreke baş û tê- kûz danîne.

Di navbêra oêçmergan û dijmin de tişteki hindik mabû ku, bigihên hev. Şiqû pûşmergan yê yekemin xwe gelekî nêzîkî dijmin kiri bû. Li



bfifti tixûbên diimin ji xwe re cihên asê yê paraztinê girtin u karê xwe û şer kirin.

Li 'liyê din şiqş dudo, sisê û çaremin ji xwe baş nêzîkî dijmin kirin. Ew man li benda destpêkirina çerê çiqê yekemin.

Tev li benda destpêkirina şe^ şiqş yekemin in.

Piştî qederekê, dengên çek û tifingan tari- ya şevş çirand û çiqê yekemin dest bi şer kir.

Di tariya çevê de bû şer û ceng.

Dijmin nema dizanî bûn bê çi qewimî. Leşge- rên dijmin sergê j, sist û çav li xew radihiş- tin çekên xwe û ber bi dengê çekan ve dibeziyen. Dijmin leqgerê xwe tev dan ser çiqê yeke- ' mîn. Piştî qederekê çiqên din jî dest bi şer#" kirin, dora dijmin girtin û dest bi kuştina wan kirin.

leçgerên dijmin di nava çar agirana de ma- bûn. Bi ku de diçûn gûle û berik li w<-. n diba- riyen.

Di nava tariya şevê de leşgerên dijmin yên ji tirsan. yên ji tiçtên din gelean ji wan xwe winda kirin. Risq û siûda wî hebû yê ku canê xwe xelas bikira.

Pêçmerge tev keti bûn navi ^ev û bi hev re çerê dijmin dikirin.

Xanê bi dizî xwe jilçiqê xwe veqetand û be- rê xwe da qonaxa serleçgerê dijmin. Welat ca- rekê li teniştê xwe%erî lê Xanê ne dît. Wî jî xwe ji hevalên xwe veqetand û li Xanê geriya.

Pêçmergan derbeke mezin li dijmin xisti bûn. G-elek ji dijmin hatin kuştin û gelek jî birîn- dar bûn. Tenê Ic'gerên qonaxa serleçger ma bûn.

Serleşger di mezela xwe de diçe û tê. Çend leşger jî li ber devê derî ne. Haya serleşger jê tune ye ku, leşgerên wî tev hatine kuştin.

Xanê xwe nêzîkî qonaxa serleşger kir. Daxwa- za vê ku, serleşgerê dijmin bikuje. Xanê xwe bi dizî gihand ber pencerê(rojînê). Di pence- rê re li hundir mêze kir, dît ku, va serleşger. Mlhundirê mezê de diçe û tê.

Xanê di pencerê re berê tîfingê xist sîn- ga serleşger û lingê wê kişand

teq teq teq teq teq teq

Serleşger bê ruh kete erdû. Leşgerûn li ber devê derî çaxa derî vekirin û ketin hundir, hema Xanê ew jî li erdê vezilandin.

Piştî Xanê ew kuştin, rabû çû hundirê qona- xê. Tifinga wê di destan de û li ser cendekên di^min sekinî. Ji ber ku, leşger li wir nema bûn, Xanê bê tirs li hundirê qonaxê rûnişt.

Hadî, çaxa çav li Welal kir ku, tişteq qewim! û jê re got:

-Çima madê te ne xweş e Welat? tu çavên xwe li tişteqî dîgerînî?

Welat çav bi hêstir got!

-Ez li Xanê diğirim, lê min ew ne dît, nebe tişteq pê hati be?

-Xanê ne zarok e, tişteq pê nayê, ma te li qo- naxa serleşger nerî?

-Na, min li wir ne nerî, ma gelo li wir e?

-Dibe ku, li wir be. Xanê pir tiştan difikire dibe ku, tiştên mezin kiri bin.

Pêçmergan piştî ku çiya ji leşgerên dijrain safî kirin, xwe berdan û berê xwe dan qonaxa serleşgerê dijmin. Wan digot qey hê serleşgerê di, imin sax e.

Pêçmerge bi dizî ketin dora qonaxa serleş- g-er. Wan digot qey di qonaxê de gelek serleş- ger û leşger hene. Lê dûvre nerîn ku, tu deng ji qonaxê nayê, îcar bê tirs ketin qonaxê.

Lê çaxa ketin hundirê qonaxê man ecêb may Dîtin ku, va Xanê tîfing di destan de û rûniştî ye. Serleşger û çend leşger îî bê ruh erdê vezilandî ne. Wan fêh kirin ku, Xanê kuştine.

Bi vê dîtinê pêşmerge tev dilxweş bûn. Xanê tiştêkî pir mezin kiri bû. Xanê serxwegirtiya- xwe bi cîh anî bû û dilgeş bû.

Xanê êdî roj bi roj di nava hevalên xwe de bêtir bi rûmet û bi qedir bû. Pêşnergan pir rêzdariya Xanê digirtin.

Welat dawîya pêşmergan teva bat qonaxê. Çaxa çav li Xana xwe kirPbêhna wî fireh bû. He- ma bi xar çû aniya Xana xwe maç kir

-Bijî lehenga Kurdan

Pêşmergan teva li qonaxê xweha xwe Xana leheng pîroz kirin. Tevda biryar dan ku, Xanê xelat bikin. Divê ji Xanê re xelateke hêja bi- hata standin.

Wê çevê pêşmergan li hevalên xwe pirsîn û li hev kom bûn. Hevalên wan tev sax bûn. Lê tenê çend pêçmerge hati bûn birîndar kirin. Wê çevê birînên wan derman kirin û pêçan. Lê xew ne ket çavên wan, ji kêfa re ma xewa kê. dihatl Heta serê sibê li ser serketina xwe axivîn û serketina xwe pîroz kirin.

Vê carê derbeke pir mezin li dijmin xisti- bûn. Birînên dijmin bê derman bûn.

Adinî rojê pêçmerge tev rûken û dilgeş tê li ser çiyayên ku, j i dijmin standi bun, geri- yan û bêhna xwe derxistin.

Erd û çiyayên xwe ji bin destên dijmin riz- gar kiri bûn. Ala rengîn li ser çiyayekî bilind bê r bi ba diket û pêl dida. Weke rojê ku, tîrê- jên xwe berde ser dinê û dinê xweş bike. Lê pêldana ala rengîn hê jî xweştir bû. Ji ber ku, ew bi xwîna pêçmergeyên leheng, bi xwîna keç û xortên Kurdistanê hati bû standin. Ji wê yekê ala rengîn rûbiken û serefirazî pêl diba. Pêçmergeyên mêrxas li h ember ala rengîn bextewar û ji kêfa re hêstirên wan ji ber xwe ve dihatin xwarê. Heta bi hêstirên wan jî, ji— bo ala rengî diketin rêzê û b'germîtî xwe ber- didan xwarê.

Wê rojê pêşmergan biryar dan ku, serketina xwe bi govendekê mezin pîroz bikin. Rabûn çend hevalên xwe şandin bajêr ji bo ku, gewendan (daholvan û zirnevan) bînin û ji bo Xanê jî xelatekê bistînin.

Bi çûyîna pêçmergan. serketina wan li her cîhî belav bû û hat bihîstin. Li gelek bajar û gundan govend ji bo serketina wan li dar xisti bûn. Tevda serketina pêçraergeyên leheng pîroz dikirin

Lê nav û dengê Xana leheng ji deva derne- diket. Ji gundan derbasî bajaran û ji devan dikşt devan. Her kes li Xanê diman ecêb mayî û digotin çawa serleçgerê dijmin kuştîye.

Bi belavbûna nav û dengê Xana Kurd, keç û jinên Kurd yên din jî, ji wê fêre digirtin û dixwestin ew jî bibin weke Xana mêrxas û ji- bo serbixwebûna welatê xwe şer bikin.

Ji her derî, ji her gund û bajarî ji pêş- mergan re pîrozname dihatin. Her kesê Kurd bi serketina pêçmergeyên xwe serbilind bûn û baweriya wan bêtir li rizgarbûna welatê wan dihat.

Ji aliyê din dijmin bi vê serketina Kurdan stuxwar û birîndar bû. Tu cara derbeke weha raezin ne xwari bûn. Êdî birîn bê derman bû.

Adinî rojê pêçmerge ji bajêr vegeriyan. Bi xwe re daholvan û zirnevan jî anî bûn. Ji Xanê û keçên din jî re xelat standi bûn. Ji bo her keçeke Kurd zêreke girover û bi zincîr standi bûn.

Wê rojê pûşmergan teva li ser çiyayên riz- garkirî govenda azadî û serbixwebûnê li dar xistin. G-elek Kurd ji gundan hati bûn û ew jî keti\ aûn govendş.

Bi govendê de xelatên keçên Kurdan jî bi wan vekirin. Teva hev pîroz kirin. Keçên Kurdan gelekî kêfxweç bûn. Keçan jî destên xortên Kurdan girtin û ketin govenda serketinê.

Bi govendê de dengên çek û tifingan xweşi- yeke din dida govendê. Çaxa govend li dar keti bû. ala rengîn jî, govenda serketinê li he- wa pîroz dikir û pêl dida.

— welatî bidin ser milên

heval, hevrê û hevbîrên xwe.

Birayê Xanê Hadi jî, wextê dibistana wî hati bû. Ew ê ji bûba mamosteyê gundê xwe û wê zarokên gundiyan yên Âurd hini xwendin û ni- vîsandinê bikirana.

Li gund kar û barê hatina pêçmergan diki- rin. Gundî tev li benda hatina wan bûn. Yên ku li benda hatina mêrê xwe, yên ku li benda hatina keç û xortên xwe û yên ku, li benda hatina birayên, xwe, çavên teva li riya wan bû. Gun- diyan daholvan û zirnevan hazir kiri bûn âa ku govenda pêçmergeyên xwe li dar xin.

Keç û jinên gund tev li benda hatina xweha xwe Xanê leheng bûn. Ji zûv de ew ne dîtî bûn û gotinên wê yên xweçne bihîsti bûn. Ew li benda hatina Xanê bûn da ku, bê û serpêhatiyêr. xwe ji wan re bêje.

Keçên gund yê xort û ghiştî, çavên wan li riya hatina hezkiriyên xwe bûn. Bi hatina wan, wê cardin evîniyek germ û xurt ew hembêz kiribana û wê bi evîna hev biçewitiyana.

Roja wan ya dawî jî hat û lê xist. Pêşmer- geyên çûnê xwe kar kirin. Pêçmerge tev li hev kom bûn. tev ketin rêzê û li ser lingan sekinî man. Hevalekî wan çû ber ala rengîn, hêdî hêdî şerîta wê kişand û ala rengîn hêdî hêdî li he- wa dest bi pêldanê kir

Pêşmergan teva bi hev re dest bi xwendina xweşxwana Kurdî ya gelêrî kirin:

"Ey raqîb her maye kewmê Kurd ziman Naşike û danayê topên zeman Kes nebê Kurd dimirin Kes nebê Kurd dimirin Kurd jî jîn divin Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan

Em xortên Medya û keyhusrew in Seyr bike xwîna diyan me da ri. îand

Kes nebê Kurd dimirin Kes nebê Kurd dimirin Kurd jî îin divin Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan

Em xortên rengê sor û şoreş in De bi xwîn neqşîn bikin taca cîhan

Kes nebê Kurd dimirin Kes nebê Kurd dimirin Kurd jî înjîn divin Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan

Lawê Kurd tev şiyarbûne wek\_şşran Dîn iman û ayînîman Kurd û Kurdistan

s nebê Kurd dimirin s nebê Kurd dimirin urd jî jîn divin Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan

awê Kurd tev hazir û amadene Can feda ne can feda her can feda

Kes nebê Kurd dimirin Kes nebê Kurd dimirin Kurd jî jîn divin Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan" -75-

Piştî xweşxwan qedandin, dilê teva bi xurtî hildavêt. Tevde ser bilind û bextewar bûn.

Xanê cara p<sup>^</sup>şîn bû ku, xweşxwana gelêrî dix wend. Ji wê yekê dilxweşbûna Xanê, lehengbûn û serbilindiya wê li wir dihate dîtin.

Hevalên Xanê tê derdixistin ku, Xanê ji dil xweşbûnş çavên wê tijî hêstir bûne. Ew jî we- ke xwîşka xwe Xanê serbilind û bextewar bûn

Piştî xweşxwan qediya, pêşmergeyek 3 i w yê zana, derket s er latekê û gazî hevalên xwe kir û got:

-Hevalên hêia, pêşraergeyên giranbihal Em bi hatina we gelekî serbilind êf dilxweş in. Hatina we pişta me qewîntir weriya me zêdetir kir. Em êdî bawer dikin ku hevalên me yên rizgarîxwaz, hevalên me yên ku bikaribin welatê me biparêzin û xwe ji bo we- latê xwe gorî bikin henin. Ev hebûna hevalên weke we tekoşer û rizgarîxwaz, tekoşîna me xurt tir dike û ro. jên serbixwebûna welatê me û azadiya gelên me nêzîktir dike.

Ei hatina we, bi alîkariya we, me derbeke me- zin li dijmin xist û birîneke bê derman di laşş dijmin de vekir. Ev ji bo me serketin û 3 i bo dijmin mirin e.

Em sunda mirinê dixwin ku, ji ser çiyayên xwe neyên xwar, ta ku, welatê me serbixwe û gelê me azad bibe. Doza me wê her hebe û heta- ku, mêrekî Kurd\*li ser rûyê erdê hebe, wê teko- şîn û şerê me berdewam be.

Divê em vê jî bizanibin ku, êdî me dijmi- nên xwe nas kirine. Pijminên me Emperyalîzma cîhanê, qolonyalîzim, faşîzim û feodalîzm e. Herweha ev dijminên gelên bindest yên cîhanê ttvâ ye. Li hember Emperyalîzma cîhanê û li hember vîlik û planên wê

divê her mirovê de- moqrat û welatparêz xwe bavêje qada şer û li dijî vê rista dijmin şer bikin. Ger ne weha be serketina me diiwar e. Divê em vê ji bizanibin ku, hemû milletên bin dest û karkerên dinê birayên hev û hevalên hev in. Di şerê me yê li dijî Rîiperyalîzmê de rista sosyalist, tevgerên netewî yên gelên cî- hanê yên rizgarîxwaz û karkerê dinê heval û piştgiirtiyên me ne. Divê em xwe ji wan bi dur- nexin, divê bi her awavî em bi hev ve girêda- yî bin.

Pêşmergeyên me yên leheng dê tucarî rane- westin, tucarî serê xwe ji dijmin re natewînin wê her dem ji bo paraztina welatê xwe û domkirina jîyana gelê xwe şer bikin.

Hevalno '.

-Hûn çawa bi xêr hati bin, hêviya me ew e ku, hûn cardin bi xêr û bi dilekî xwe? vegerin nava malbat û zarokên xwe. Hatina we û alîkariya we, wê ji gelên Kurdistanê re bibe nişan.

Ev serxwegirtî ya hemû Kurdan e. Bê yekîtî em nagihên armanca xwe û serfiraz nabin. Divê her kesekî Kurd ji bo yekîtiya Kurdan û Kurdistanê xwe bêşîne û xwe nede pup. Hêza me ji yekî- tiyê der tê. Em li vir sipasiyên xwe berpêşî we dikin. Nemaze xwîşka me Xant û yên din, em serbilind û bextewar kirin. Ev mêraniya we nayê ji bîr kirin û hûn ê tim di dilê gelên Kurdistanê de bin. Weke"Çêx Seîd, Seyid Riza, thsan Nûrî paşa, Şşx Mehmûdê Berzencî, Qazî Mihemed, Barzanî, Leyla Qasim, Şello(Margrêt) û. h. d. " weke wan mêraniya we ji wê her di dilê me de be. Em vê xebata we ji bîr nakin.

Di dawiyê de em va gotinan dibêjin "Bila bijîn pêşmergeyên qehreman"

"Bila biji tekoşîna gelên bindest ya ji bo serbixwebûn, demoqrasî û sosyalîzmê"



"Bila her biji Kurd û Kurdistan"

Zor sipas

Teva li çepikan xistin. Hevalê wan xweş axi vî bû. Dilê teva bi gotinên hevalê wan xweş bû.

Piştî axavtina hevalê wan xelas bû, bira- yê Xanê Hadî jî denket ser latê û wî jî çend gotin gotin. Piştî Kadî gotinên xwe gotin, pêç-raergan ji wî re jî li çepikan xistin.

Piştî van gotin û axavtinan, hevalekî ji yê wan hat û raizginî da wan -Gelî hevalan, hevalên me yên çûyî va hatin

-Her bijîn, her bijîn -Her bijîn, her bijîn.

Piştî qederekê nerîn ku, va hevalên wan tev bi hev re hatin.

Tev çûn pêqiya wan, çûn dest û rûyê^hev û" hevdû bi hevrêtî û biratî hembêz kirin.

Hevalên wan yê nû hatî, serketina\*wan pîroz kirin û bi serketina hevalên xwe serbilind bûn. Teva qederê du sê seetan li ser serketina xwe li ser rewşa dinê û li ser pirs û pirsiyarên hev axivîn. Tevde bi rûken û bextewar bûn. Ev rûkenî û bextewarî ya serketina wan bû. .

Çiyavên Kurdistana çêrîn ji pêçmergan hati- bûn xemilandin. Her yekî weke şêran bi heybet bi hêz û li ser xwe bûn. Çavên wan weke pirin- gên êgir di nava serê wan de dibiriqand. Meriv li ser lat û zinaran dinihêrt, meriv didît ku her lat û zinarek, her dar û deviyek, pêçmerge- yekî dest bi çek li ber e û zinar û lat, darlı devî bi van pêçmergan serbilind in.

Çiya tev bi pêqnergan dilxweş bûn. Par û deT viyan ji kSfa wan re şax û guliyên xwe bê tirs berdidan. geya bê tirs mezin dibû, çûk û

çivî- kan, kew- û kevokan, teyr û başokan, bi dilxweşî li ser çiyân dixwendin û wan jî serketina pêç- mergan bi zimanê xwe pîroz dikirin.

Çiya rizgar û lawir û tebayên li ser jî azad bû bûn. Ji çiya û newalan, ji dar û devi- yan, ji çûk û çivîkan, ji keroşk û xezalan, ji her lawirî û bi her zimanî ji pêçmergan re -

pîrozname dihatin. Lawiran teva bi zimanê xwe serketma wan pîroz dikirin û dixwendin.

Çiya û newal, zozan 0 berî, lat û zinar êdî ji bin destên diiminên qolonyalîst rizgar bû- bûn. Serê sibehan rojê tirêjên xwe bi kêf berdidan ser çiyân û ew bi tirêjên xwe pîroz di-kirin, çuk û çivîkan, kew û kevokan êdî bê tirs li ser lat, zinar û dar û deviyân dixwendin. tirs hêlînên xwe çê dikirin û meriv heweskaj dima ku, li bin siya darekê an latekê rûnê li xweşiya dengê wan gundarî bike.

Xezalên çavbelek, xwe ji latan davêtirj se] latên din. ji kêf a re kevir 3i ber lingên dipengizîn, ji xwe re lotik davêtin.

Şivan û gavanan her sibe bi kêf? bûn ser xwe û bi xwestek pez û dewa] dan ber xwe û bi rûkenî berê xwe^lli yên rizgarkirî. Şivanan li ber pez, derd û ku- lên xwe bi bilûrên xwe tanîn ziman, bizin û mîh ji kêfa dibariyan û guhdariya dengê bilû- ra çivanê xwe dikirin.

Bêrîvaniyan serê sibehan bi koman didan dû- hev, bi rê de distiran. geh bi tenê, geh bi hev- re digotin û geh îî davêtin ber hev, Bi rûkenî û dilgeşî diçûn berîvd û vedigeriyan.

Dengên çûk û çivîkan, dengên kew û sûskan weke tembûrên hozanan, weke bilûrên sivanan, weş ke zîzbûn û xweşbûna dengên Xecên Kurdan bi meriv xweş, dihat . Meriv dixwest ji sibê heta -

êvarê ji xwe re li dengê van lawiran gundarî bike , hevqasî kû, xweş û bi aheng bû.

Bilind bûn û pir bûna darê berû û deviyên bi kat û şax, hêhna meriv derdixist. Meriv he- weskar dima ku, here ser zinarekî bilind il ji- xwe re têr li xweşbûna çiyân, lat, zinar, dar û berên Kurdistanê binihêre. Nexasim ku, çaxa meriv diçû ser çiyayekî bilind û li gundên Kurdistanê dinihêrt, weke koma çûk û çivîkan ji meriv re xuyanî dikir. Erda Kurdistanê rengîn bi gundan hati bû xemilandin. Bi wê hewa paqij- û bijûndar ve tenê ev dihat bîra meriv"Bi huş- ta me Kurdan. tenê Kurdistan e'. '

Hadî, Welat, Xanê û hevalên xwe, hêdî hêdî ji hevalên xwe yên pêçmerge veqetiyân û ji hev bi dûr ketin. Heta ji ber çavên hev winda bûn jî, teva destên xwe ji hev re dihejandin

Tam mehekê li cem hev û bi hev re man û bi hev re çerê dijmin kirin. Hilfa wan çûbû ser hev. Ji wê yekê çaxa ji hev veqetiyân çavên te va bi hêstir bûn. Bêhemdî wan hêstirên wan bi- ser hinarkê rûyê wan de dihatin xwarê.

Hadî û hevalên xwe pêçmergeyên xwe yên le- heng li ser çiyayên Kurdistanê rengîn pârêz, ger hiştin û berê xwe dan gundê xwe. Dilê \*teva hê li ser hevalên wan bûn. Heta ku çûn gund jî hêstirên wan bêhemdî wan dihatin xwarê.

Pêçmerge man li ser çiyayên welatê xwe. We- ke berê wê welatê xwe ji dijmin biparaztina. Teva bi yek dev û yek sîndê sînd xwari bûn ku, ji ser çiyayên welatê xwe neyên xwarê ta ku, welatê wan serbixwe û gelên wan azad bibin.

Gundî tev çav li rê ne. Li benda hatina şer- kerên xwe bûn. Gundiyan çend zarok şandi bûn serê çiyavên dorhêlê ji bo ku, çavnêriyê bikin. Hadî, Xanê, Welat û hevalên xwe şev û rojekê bi rê de meşyan. Nêzîkahî li gund kiri bûn. Çaxa gihan nêzîkî gund, biryar dan ku, hinekî bêhna xwe berdin. Rabûn li nêzîkî gund qederê nîvseetê rûniştin û bêhna xwe berdan. Dûvre. ra- bûn û eardin dan s er riya xwe.

Zarokân li serê çiyân çavnêrî dikirin. Ye ji wan ji dûr ve dît ku, va xort û mêrê tèn.

-Kuro va h. atin, zû herin mizgîniyê bidi divan.

Zarok çûn û mizgînî dan gundiyan. Gundiyan rabûn daholvsn û zirnevan dan pêçiya xwe û çûn pêçiya çerkerên xwe.

Hadî û hevalên xwe çaxa dengê dahol û zir- nê sehkirin, fêm kirin ku, gundî hatin pêçiya wan, kêfa wan pir dihat.

Jin, zarok, keç û xort, pîr û kal teva dabûn dû hev, dabûn ser rê û ber bi wan ve dibezî- yan. Cardin bu teqe teqa çek û tifingan. Meriv digot qey şerekî nû dest pê kiriye.

Çaxa gihan nêzîkî hev, tevde beziyan û xwe çeng kirin hev. Mezin diçûn çavên piçûkan. pi- çûk diçûn destên mezinan. Bav û dê diçûn rûyê lawên xwe, jin û mêr hev herabêz dikirin, keç û xort bi hezkirinekê germ li hev raêze dikirin dilê evîndaran bi xurtî hildavêt.

Tev bi hev re, bi def û zirne, hêdî hêdî ber bi gund ve meşyan.

Piştî qederekê gihan gund. Gundiyan rabûn panzdeh bîst sewal ser jê kirin û dest bi çê- kirina xwarinê kirin. Gundî û pêçmergeyên hatî li hev kom bûn.

PSşmergan serpehatiyên xwe ji gundiyan re diFOtin. Gundiyan jî ew pSroz dikirtn. Bi wan geleki serbilind bun.

Xana çeleng jî keti bû nava keç fi jinan fi wê jî serpehatiya xwe , ii wan re digot.

Rabûn 11 gund sê roi fi sê şevan govendek li dar xistin. wek dem fi dewranên berê ji her gundî, ji her cîhê xelq hatin govendê. Nemaze ji bo dîtina Xana leheng dihatin.

Xanê bi xwe re aleke rengîn jî anî bê. Di govendê de Xanê fi Welat di destên hev d^Xa- nê ala rengîn ber bi hewa vedikir fi dihejand

Nav fi dengê Xanê li her derê belav bfi. Gele! xort fi keçên Kurdan ji Xana leheng fêre gir- tin fi wan jî xwe ji bo welatê xwe avêtin qa- da şer fi tekoşîn ê.

Xanê fi evîndarê xwe Welat, gihan meqsed fi miradê xwe fi jiyana xwe li gund domandin.

Piştî derbasbfina wext fi zeman, zarokên wan hatin dinê. Zarokên wan jî mezin bfin, wan jî ji dayika xwe ya leheng fêre girtin fi wan jî bi mêranî dan ser rê fi şopa bav fi kalên xwe Q li ser çiyayên Kurdistana rengîn wek dê fi bavê xwe bfin pêsmergeyên qehreman yên Kurd fi Kurdistan.

Xanê weke gelean ji keçên Kurdistanê, we- ke "Leyla Qasim, Şello(Margrşt) fi. h. w. d. da diyar kirin fi gotinên bav fi kalan anîn cîh

ku''şŞR ŞER E ÇI JLN E ÇI MER E''

Bila her bijî Kurd fi Kurdistan

DAWI

B\_I\_R\_Î\_N\_D\_A\_R

Nexwişxânê~2Inâfiya

1982

Jiyana min bê te nabe Ey welatê Kurdistan Rehên laşê min rawestîn  
Tuyê xwin û ruh û can

Tu dara jiyana me yê Em in şax û gulên te Ger tu herdem hêçln nebî  
Jiyan tune bê guman

Ji bo te va Bûn xemgîn û dîl û jar Tuyê êçb% tuyê bijîşk Tuyê ji bo

Birindar

BIHA -5 DM

\*\*

## KEPEZ Ê XEWNA

DOSTOYEVSKÎ

XEMGÎNÊ REMO

Kurdistan - 2008

KEPEZ Ê XEWNA

\* Nivîskar: Xemgînê Remo

Kevalê bergê Ji tura înterinêtê

Derhênana hunerî û berg: Mihemed Mela Hemdî

Ji we anên: Êketiya nivîserên kurd/ Duhok

We ana hijmare: (130)

Jimara spardinê (316) li sala 2008

ROJIN DÎROKÎ

DI JÎYANA GUNDÊ ME DE

Nasnameya gund :

Gundê me yê kevnar, bi dirv û nî anên

xwe, wekî hemî gunda ye. (bibûrin) ne wekî ti gunda ye, gundekî li go eyeke ji bîr bûyî, li bin lingê çiyakî bilind avêtîye û çî kes nizanin ku li kîjan serdemê ava bûye.

Ev gund, her wekî ku ne li ser vê goga zemîn dijî, belê li ser gogeke dî tire, çimkî hîç bi ber bayê pê veçûnê neketî ye, û neji dizane aristanî çîye, xelkên gundê me, li hemî demsalan, têkelî yên wan bi pez û dewaran re ne û gelekî bi axa xwe ve girêdayî ne, rê û rêwanî jî bi vî gundî nakevin, rê yên ku têne gund ivarêkin, xelkên gund, hîn rê yên oza nedîtine, û neji dizanin Elektirîk çine! Her wiha bi Radyo û Telfizyona jî nebihîstine, lê mirovnî dizanin çixare yan bipêçin û tizbî yan bik înin û pir mêrxas û sekmanin, ji bo çêçikek mirî kan dikarin cehokên xwînê birjînin, hîç zordestîya zordaran ne pijirandine û neji serên xwe ji kesî re diçimînin .

**BÛYERA YEKEM :**

li wê roja ku du keç û xortekî nenas hatin gund, rojeke gelekî seyir bû, di jiyana gundî yan de, di gel ku herdu keçik û xort, bi zimanê gundî yan jî dipeyvîn, lê gundî hîç di angoya peyvên wan de nedigihi tin ku çî dibêjin!! tenê bi çavnî fireh û dev ji hev vekirî li hev dinêrîn û bi peyv û cilên wan dikenîyan! Pi tî demek dirêj ji guft û goyan, axa yê me nema karîbû xwe ragirta, berê

xwe da xort û bi awakî îretvanî jêre got ( lawo !  
ji sibêde we serê me gêj kir û me ti tek ji we fam  
nekir, kurê min, rast bêje, eger te ev herdu keçik  
revandine, ji mere bêje, ku em li ber barê we  
rabin û we bi parêzin, va riha min sipî bûye û ez  
bi gopal dime im, lê min hîn nedîtiye, ku xortekî  
ji keçekê re gotî ye: hevala min!! yan jî keçekê ji  
xortekî re gotî ye: hevalê min ! hevaltîya xort û  
keçan, tenê yek wate ya wê heye ...? ) pi tî  
axaftina axê, pîrejinekê jî ji nav civatê, berê xwe  
da herdû keçkan ( bi xwedê min hîn jî bawer ne  
kirîye, ku evana keçikin .) û herdû destên xwe,  
dirêjî pa ilên wan kirin, ku destên wê gihan  
memikên wan de, mîna ku destên wê bighên  
bizotên êgir, bi ûnde noq bû ( keçik û por kurt!!  
Bi erwal û di gel xortan ? qey dawî ya dinyê ye  
!! )

**BÛYERA DUWEM :**

Roj dihatin û diçûn û meh li dûv mehê, sal  
zîvirî, di eveke ziviztanî de, xortek û du keçik ji  
gundê me winda bûn, xort bi navê Cengo û  
herdû keçik, yek nîroz ya din Jînê, Ew ev bû  
eveke dîrokî di jîyana gundê me de, ji roja ku  
gund ava bûye, bi dirêjahî ya dîroka xwe, ya  
sedê salan, yekem car bû, ku bûyerek wiha lê rû  
dida, ji ber ku heta berî wê eva dîrokî jî, hîn  
piranî ya gundî yên me wiha dihizirîn: ku ji  
sînorê çend gundê êla me wêde dinya nîne, û



eger ku hebe jî, dinyak biyanî ye, ji bo me ne  
giringe û ev keç û xortên ku her demekê hinekî  
nih tîn û tim dibêjin: welatê me welatekî fireh û  
dirêje, û bi hemî gund bajarên xwe, pêkve di bin  
çoyekî qirêjî de bindstin" ev peyv û gotinên wiha  
pûç û xavin, di mejî yan de nayêne meyandin..  
Sibehê, gava gundî li hev civîyan, û  
windabûna hersê gencan, dan ber guft û goyan,  
kesên ku ev widabûn li xwe a wan hatibûn,  
gelekî dil ad bûn, û bi serbilindî digotin: vêca ji  
niha û pêve, emjî dikarin di nav xelkê de bêjin:  
gundê me jî ji kar û xebatê bi ûnde nemaye" û  
kesên dijberî vê windabûnê jî, bi zivêrî ne razî  
bûna xwe didan der, lê ji herdû alî yê hevdiş,  
xortekî ciwan, di nav civatê de,gelekî bê zar bû,  
ewjî Siyamed ê pismamê Jînê û destgirtî yê wê  
bû, nema dizanî ne ku digel alî yê ge bîna  
bikene, yan di gel yê bêzaran bigrî, geh pêlên  
kerb û kînê di dil de tev radibûn, ku rahêje çeka  
xwe û bi dûv jînê keve, ku wê li kîderê bigre wê  
fî ekekê di serî de vala bike, lê gava peyvên jînê  
dihatin bîra wî, pertavên wî sist dibûn : siyamed,  
eger ku bira tu ji min hez dike û destgirtî yê  
mine, divê ku zewaca min û te li serê çîyan be,  
dê û dapîrên me, bi dirêjahî ya dîrokê zewicî ne  
û di bin bazikên mêran de, em anîne ser rûyê  
dinyayê, lê دنیا çî û ji bo çî ? me heta niha  
nizanî bû ev bersiv bida, ku wate ya anîna me û

mana me li jîyanê ji bo çîye û ji bo çî em dijîn ?  
siyamed, min zewaceke wiha ser opî her wekî  
ya dê û dapîran navê, ku ez tenê Bibim kurk ji  
bo çêçikan, min zewaceke dî tir û govendeke  
fireh tir divê, û gustîlka te wê di tilî ya min de  
bimîne, eger ku tu li dûv min hat ezê gelekî  
dil ad bim, û eger tu nehat, ji xwe kurkên ji bo  
çêçikan bo te pirin ! ( ji wê dêlika Sitêrê fêrî van  
peyv û gotinan bibû, wê dêlikê bi ev û roj di  
serê wan de dixwend, çima berê ne  
wiha bê

tore bû? gava ku dilgirtî ya min bû, bawer ne  
dikir, ku ez jêre çêla zewacê bikim, dihat ku  
bifire, dêmên wê sor dibûn û mijdankên wê bi  
ermokî lêdidan, hemî ji bin serê wê bê bavê de  
bû, ku hat ku tin jî em jê riha ne bûn, tim bi poz  
bilindî digot : ez li bajarê xwe mamuste ya  
dibistanê bûm, lê dibistana çî û fêrbûna çî ? ku  
fêrbûn ne bi zimanê mirov be , mirov gîyanê  
xwe di wê fêrbûnê de nabîne, ji bilî ku em  
zarokên xwe fêrî zimanekî biyanî dikin, û mejî  
yên wan bi bîr û bawerî yên dijminan di on,  
Dijminê ku her ti tî xwe, bi kotekî, bi me dane  
pijirandin, Emê ji bo çî dîrokek sixte, ya ku  
dijminan nivîsandine, bi zarokên xwe bidin  
zanîn? dîroka ku rehên me ji binî de dibirin û me  
ji avakirina aristanî ya navçe yê bê par dikin,  
Gelî hevalan, ez niha gelekî dil adim, ku ez bi

zimanê me we fêrî xwendin û nivîsandinê  
dikim,... û dawî te soza xwe bi cîh anî jînê, te ez  
hi tim û tu çû tola mamuste ya xwe hilîne, ji roja  
ku te bi nûçe ya ku tina wê bihîst, tu bêtir har  
bû, te dev li xwe dikir û te laqirdî yên xwe bi  
hemî cure yên jîyanê dikir. )

**BÛYERA SÊYEM :**

Wê roja ku gundî yan bi nûçe ya ehîd  
bûna Cengo bihîstin, ew roj jî bû rojek bi nav û  
nî an, gund Ji ser û bin hejîya, û ji ber ku  
hevalan nikarîbûn termê wî bînin, vêca li rex  
goristana gund, goreke sîmbolî Jêre çêkirin û  
itleke zeytûnê di ber kêla serî de çandin û bi  
diri me û çepikan govenda zavanî ya wî, li  
gorepana gund, di gerandin, lê siyamend dîsa jî  
bawer ne dikir ku Cengo hatî ye ku tin û ev  
helkeft, bibû egerê bîranînên wî, Yên ku di gel  
Cengo bûrandibûn, zaroktî ya wanî pêxwas û  
Tazî, lîstikên wanî li derdorên gund, ivantî ya  
karik û berxikan, sinêlî ya ku li dûv keçikên  
gund diçûn ser kanî yan, xortanî ya li nav rez û  
werzan, xelk xelek li dûv hev Dik îyan û di ber  
çavan re diçû, heta ku aheng bi dawî bû,  
siyamend bi ser xwe de diponijî, di pêre xortekî  
wî xewle kir û nameyek dayê .  
ev zîz û bê deng bûye, ji qêrîn û hewara  
gundî yan, hîveke ge î sor, hêdî hêdî ji nav çîyan  
bilind dibe geh ewrên rû re wê vedi êrin û geh

ew xwe ji wan vedidize û diyar dibe, di gel kewtî  
na kûçikan ku serên xwe berjor ve kirine û  
dizûrin, li ber rohnî ya çirake lawaz, siyamend  
name yê ji bêrîka xwe di derîne û hêdî-hêdî  
dixwîne ( bi navê welatê êrîn, pi tî rêz û silavên  
germ, Siyamend, siyamedo..! gustîlka te, hînî di  
tilîya min deye Lawê delal, û ez hîn jî çav li rêya  
teme, de were.. were, Bende wara te Jînê ...  
Kûr keserek ji kevçika dilê wî tête der, destê  
xwe dirêjî kîsê tûtînê dike, çixare yeke sitûr  
dipêçe, û Jînê perwane yeke rengîn, di nav dûyê  
çixarê re li ber çavan dilîze ( pi tî vê dema dirêj,  
te av çend peyvên kurt bo min bi rêkirine Jînê !?  
û ez yê di arê avîna tede tême sotin, jînê tu jî bo  
Binev a narîn û te divê ku ez jî bibim Cembelî û  
li dûv te bêm, te gelek caran ev çîroka dildarî-  
Yê, li dema berev kirina tirî ji min re digot, berî  
ku em Sitêrê nas bikin, ew mamuste ya ku hate  
ku tin û evîna mejî bi xwere ku t, gerekî tu niha  
jina min ba û di vê eva buharî de, di ber sînga  
min de ba, xiv e ya nazdar, Te ez kirime  
kelemperê li ber bayê payîza, û hayê te ji Min  
nîne, ku pelê dara evîna min zerbûne û diwe in ji  
Darên gwîza .

Ji wê roja ku jînê siyamend li dûv xwe hi tî  
ye û Bi serê çîyan ketî ye, ji wê rojê de siyamend  
ne li hi ê xwe ye, bûye wek kîsekî vala ku çawa  
bi ber ba dikevin, ewjî wiha, sergerdan û bê agah

li derdorên gund dizîvire, nema ne li nav civatê  
rûdinê û ne jî têkelî yên wî wekî berêne, piranî  
ya wexta xwe bi tenê dibûrîne, û her bi ser xwe  
de diponije, gundî çendî bizav dikin, ku wî ji  
rew a wî derînin, lê bê sûde ye ..

#### BÛYERA ÇAREM:

Pi tî ku roj û meh buhirîn û sal zîvirîn, êdî  
hemî rûdan, di jîyana gundê me de bi bûn ti tekî  
siri tî, heta bi wê roja ku me bi nûçe ya dîl bûna

jînê bihîst ! dîsa gund ji ser û bin hejîya, nûçe  
yek dil tezîn bû û bandora vê bûyerê ji hêsirên bi  
çûk û mezinan diyar dibû, ku sor- î ên kerb û  
kînê dilên wan dikewînin, jînê keça nazdar û  
bedew, kevokek ji refên pê î bû, ku ji gund  
firîyan, û firîna wan bû sedem ku gelek keç û  
xotên din jî li dûv wan herin, û siyamend hîn jî di  
gerînoka du dilî yê de avjenî dikir, lê pi tî ku bi  
vê nûçe ya xemgîn û dijwar bihîst, mîna ku  
xewin û hêvî yên wî yên taybet beravêtî bûn, û ji  
gumana vegera jînê, bê hêvî bû, di wê rojê bi  
xwe de, siyamend mîna ku ji xewek giran hi yar  
bû û serê wî li dîwarê jîwarî yê ket, çav li serî  
sor bibûn, dihat ku dev li xweke, ew hevsarê du  
dilî yê, yê ku wî gem kiribû, ji ni kave ikest û  
siyamed bû hespekî serberdayî, dihat ku xwe di  
ser dar û dîwaran re çeng bike û zû bighêje  
çeperên erdaran, û di wan kêlîkan de, li nîva

rojê Rahi t çeka xwe, û bi hêzeke ji xwe bawer,  
berê xwe da gundî yan ( yan jîyan yan neman ) û  
di gel çepikên biçûk û mezinan û lîlandina jinan,  
siyamend bi çîya yê rajorî gund ve rapelikî û  
çend xortên din jî dan dûv wî ..

ALÛRA BANÎ

Ewe ...?!

Belê ewe.. ma ji wê pêve kes heye ? wext ji vê  
tolazê re nîne, danê sibê û êvarî li ba wê, wek  
heve, gelo vê ji bilî i tina cilan ti karê din nîne ?  
ez çi gava li banê xênî dimeyzînim, cil li ser  
Ristê raxistî ne, yan jî radixe.

Ez carna li tevgerên wê seyir dimînim, bi  
carê min ji hi ve dibe, û carna jî mîna Robotê  
ku destin ji dûrî ve wê dilivînin, bêyî ku li  
derdorên xwe binêre, bi awakî tomatîkî, cilan  
radixe û vedigere, lê ji zûde ez gihame vê razê,  
gava ku merê wê li mal be, newêre çi tev gerên  
balkê bike .

Lê raza ku serê min xistî ye gerînoka hizir  
û gumanan eve: hîç delîveyê nade min, ez nêzîkî  
wê bibim, ez çendî bizav dikim ku hijmara  
Telefona wê bi dest xim, yan jî ku name yekê ji  
min re bavêje, bizavên min ber nagirin... ew  
dîsa çîye li ba dike ?! destmalek sore ...?  
Destmala çîye ? Klone !! çi bi nazdarî radixe !  
tevgerên vê bê bavê wek tevgerên Marlîn monro  
ne, gelo ku vêya li Holyod baya wê çi hiner

kiribana? ev eytan bira wê min dîn bike, Sado ji minre dibêje: vê hi di serê te de ne hi tî ye... vêca ew çîye ?! ber-memike ! bi nav pêsîrê xwe de digvê e û maçekê jî bi bare ji tere di îne .! Ezê çawa dîn nebim? û ezê çawa karibim xwe li ber van tenazî yên eytanî ragirim? Wê çawa hi ji serê min nefire? ev masî yek xapînoke, vê ez xistime panavek bê binî, ez çendî torên xwe ji hawîr de davêjmê, wek zîbeqêye, bi hêsanî ji nav toran di emite û li cîhekî din serî hildide! Ji banî dadikeve ber derî, ji ber derî diçe ber pencerê û ez nagihê mêmê.. wê rojê min bi dorbînê lê di meyzand, bi kirasê xewê li balkonê rûni tî bû qehwê vecixwar, geh kirasê xwe hildida bi ser kabokan dixist, geh jî gula ku di destê wê debû, di nav qehwê dadikir û dimêt, geh jî gul dixist nav pêsîrên xwe de, ji kerba min dorbîn li bin guhê dîwêr da, dorbîn tîtik-tîtikî bû . navbera min û banê xanî yê wê kolaneke, lê ez çendî li dor xênî dizîvirim, derî li ber min girtî ne, ez gelek caran, xwezî ya xwe bi wan çivîkan tînim, ewên ku bi serbestî li ser rista wê ya cilan û kenarê pencere yên wê datînin, min çendî divê ku ez bibim çivîkek û li ber pencere yeke wê rawestim da ku ji nêzîk ve lê tema e bikim, gava rûdinê, radibe, razayî be, ax û gava li ser okê di banyo de be, yan jî ku li bin

dû ê radiweste, bê guman wê çî cûda yî di navbera wê û peykerekî romanî de tinebe, xwezî ez ilêrên wê avê bama û bi ser la ê wêde bi herikyama, carna jî ez çendî dixwazim ku tivingek di destê min debe û ez devê tivingê têxim sînga wê de û wek alûrekê wê ji banî bînim xwarê û di ser cendekê wê re rawestim û serê wê di bin lingê xwe de bi perçiqînim. Ez bûme pêkenokê wê, ji dûrî ve, ji xwere bi min dilîze, gelek caran bi desta bangî min dike, lê her ku ez diherim derî di rûyê min de digre, vê serê min di gerînoka mêbûna xwe de gêj kirî ye, di xewna de jî mehrevanî yê li min nake, dayîka min dibêje ( tu vê demê ne diriste ! tu gelekî di xew de di peyive û geh dikene, geh jî diqêre, li xwe bi pirse law !? ) lê newêre ji min re bêje: ka em te bibin ba êxekî,, û dayîka min nizane ku egerê ta girtina min alûra banî ye...

Lê divê ku ez sînorekî ji vê sergêjanî yê re deynim, vê serê min kirîye kewara mê an, ... tu çima niha nare li derî yê wê nade? û eger venekir ? bi zorê veke û çî dibe bila bibe .. !!

E TAREK NÛJEN

\_ hûnê çî wextê bi me in ?



\_ siwar be pi tî çarîkekê ..

pi tî çarîkekê? ez bawer nakim , lê ezê jî siwar bim, çêtire ku ez li ser pê yan bim, çarîka we demjimêre ke, lê ji mejbûrî ye, ku niha teksî yek min jî heba ezê li ser kêfa çûbama, min ji Kamo re gotibû : ezê zû bêm,, bi rastî jî ev lawik jîre, daweta xwe xist nîvê buharê de, buhar û daweta li gund, gelekî xwe e, siri ta gunda çendî balkê e ? gund ji bîra min naçe, di xewna de jî ez gelek caran gundê me di xewnên xwe de dibînim ...marboro , winiston, benî t , dendik , qey ev lawik naçe dibistanê ? ma qirêja wî, cil û bergên wî, ev yê dibistanê ye ? seyir ne bîne, belkî niha ev lawik malxwê yê malekê be ..

zaroktî ya me çendî bê guneh bû, çendî em dil ad bûn, li demsalên buharî, wekî niha, pi tî ku em ji dibistanê vedgerîyan malê , me çente yên pirtûkan davêtin alî yekî û li nav zevî yên genim , me dida dûv çivîka û li hêlînên wan digerî yan , yan jî me kulîlik berev dikirin... marboro..marboro.. wey ! ev çîye yaw ? vêya nokan li serê lêwik dixê ! li tejî dinere û digirnije ! belkî bi kursî ya pa min re dikene , kursî ya pa min pêrek peloxê lê rûni tî ye , çavên wê di çavê min dene û çi tîrêj ji wan dirjin ! ev ji kengîde li himber min rûni tî ye ? marboro.. benî t.. dendik...

çi lawikekî rû i tî !! ji ber derî naçe û  
çavên wî li destên siwarî yane , ev keçik jî ne  
diriste, dîsa bi nazdarî nokan di serê lêwik  
werdike, lawik jî eytane , zimanê xwe jêre dirêj  
dike ! wey babû ewjî zimanê xwe ji lêwik re  
derdixe ! û awirên xwe ji te nabire , çi zimanekî  
pembe yî xwe ik , vêca lêva xwe ji te re digezîne  
û dest li ser memikên xwe dipelîne ! siwarên ..  
siwarên herin kursî ya dawî...  
off..! ev serbenikên qirêjî, ti carî nabin  
mirov, ev çi bêhna genî ye ji telîsên wan tîn ? de  
bi me e babû.. serê me gêj bû wey! em di virde  
fetisîn .. emê bi me in kalo , va emê bi me in,

demjimêr hîn dudo ye, kalo çima wiha  
zûdike ? bila bibe sisê û çar û pênc jî, ma ji vê  
rûni tinê xwe tir heye ? ma ezê herim dawetê çi  
? Kamo gelekî bi pesindan xwe dikir û digot:  
(wê piranî ya hinermendên navçe yê û komên  
dîlana bîn daweta min,) lê ez bawernakim, ku  
wê keçek wekî vê ya balkê , di daweta wî de  
hebe, ev piyala Wîskî ye, vê ez mest kirime,  
agire, min disotîne, gule, perwaneyê gîyanê min  
di ewi îne, min gelek nevîyên Sargon û em ûn  
ji nêzîk ve dîtine, di têkelî yên xwe de pir  
hemne înin, lê ev ji hemîan cûda ye, eger ku  
E tar bira afirî be, ev e tarek nûjene û  
Gilgami ên wekî min, di sotîgeha xwe de

disotîne .

hewar ..hewar !! vê ez sohtim, ez hêz û  
aristanî ya împeretorî ya Asûr pêkve, di nav çav  
û lêvên wê de dibînim çav û lêv û tilî yên wê  
min di axivînin ( were li teni ta min rune!) – ez  
dibêjim min ji zûde te dîtî ye .. na min te di  
xewna de dîtî ye ! – ma tu pêxembere ? – na te bi  
dastane ya xecê û sîyamend bihîstî ye ? – bi ber  
guhê min ketîye ..

way siyamendo !! gulîstana sînga vê  
e tarê çi bihi te ? mirin di sotîgeha wê de çi

erzane, ev çi lêvnî bizotî ne ? axx..! tu çi hare ? –  
rawest .. rawest ...li vêderê ..

wey..! ewjî çente yê xwe davêje mile xwe  
! qey ev bavê wê ye ? hîn jî bi awirnî birçî li min  
dinere, ez jî dakevim ? birhên xwe bi jor de  
hildik îne ,, û kalo ? ,, evê kotî ji kîderê derkek ?  
destê xwe li ba dike ...

oxir be êrînê, vê tenazî yên xwe bi te dikir  
, û ew tîrêjên ku ji çavên wê dirjîyan ? dîrok  
dibêje: ku istîyag ê mîdî imperetorî ya wan  
hilwe andî ye ! gelo e tarek wekî vê ya, di nav  
artê a wande tine bû? ku serê istîyag werbêj  
bikra û wî ji rê dageranda, mîna vêna, ku niha  
karîbû min ji rê ya min dageranda ? û nehi ta ez  
herim dawetê .

ERMEZARÎ

Wê êvarê, ez dîsa westan vegerîyam Hotêlê,  
Roja sisya bû, ku min di nav kar û lez û bezê de,  
û bi ser gêjanî dibûrand, berî ku ez hilki im banî,  
hevalê min, xwedanê hotêlê, deng li min kir  
(rawest.. rawest ! ) mîna yekî ku di bin bar de be,  
bi giranî ez li zîvirîm, di gumana min de, ku wê  
dîsa pê kenînekê bibêje, yan jî wê tenazî yan  
bike : tu dizane kîhatî ye ba me...? nivîskarekî  
kurd ji tikîya ! ,, peyvên wî, wekî mignatîsê ez bi  
ûnde vegerandim, min dizanî, ku hevalê min bi  
zimanê tirkî dipeyive, û berî ku ez jê bipirsim ,,  
te çawa naskir ku nivîskare ,, wî got : min qehwe  
yek pêre vexwar û di nav peyvê re, min naskir  
ku çîrok-nivîse, tê karibe pi tî demjimêre kê wî  
li vêde bibîne , niha raketî ye .  
di gel ku ez gelekî westan bûm jî, lê hizrên  
min, di nav xewnên hi yarî yê de, dûr di çûn, :

gelo wê ev çîrok-nivîs kîbe ? di van salên dawî  
de, ez çîrokên çend çîrok-nivîsan di hin govar û  
rojname yan de dixwînim û dudo ji wan gelekî  
bala min dik înin, ezê çendî bextewer bim ku  
yek ji herduwan be, emê î ev evbuhêrkek çande  
yî bibûrînin, bê guman, wê ne wekî evbu-  
hêrkên kal û pîrên wan bin, yê ku tèn  
seredanan, ji bilî nimêj û guft û goyên li ser êl û  
hozan, ti tekî dîtir nizanin, tenê di warê êl-  
perestî yê de arezane, dizanin ku her êlek li

kîjan deverê ye û çend gundê wê êlê hene û berî  
sed salî kîjan êlê çend mêr ji ya din ku tine, lê  
nizandin ku çima Bedir xan pa a erê osmanî yan  
dikir û doza çî dikir ?, berî demekê, pismamekî  
bavê min, hatibû seredana me, min pirs  
nivîskarekî ehîd jê kir, ku ji devera wan bi xwe  
bû ,, hoo..! ewê dengbêj ? rehma xwedê lêbe,  
dengê wî gelekî xwe bû ,,  
emê î ev evbuhêrka xwe, li xuwaringeheke  
xwe bi bûrînin, ezê telephonê bidim van çend  
hevalên me, yê li vêderê, bila ewjî bîn, wê eva  
me xwe tir bibe, eger wexta wî hebe, ezê wî  
bibim herêma mejî, bila çend rojekî li ba min be.

.  
ez dibêjim, belkî ez kute-demekê di xewre  
jî çû bûm, pi tî ku ez ji ser okê derketim, min  
qatek cilên nû li xwe kirin û ji jorî ya xwe

daketim salonê, hevalê min çawa ez dîtîm, bi  
erebî yek petî got ( waye lawê netewa te li wir  
rûni tî ye, ) û bi serê xwe anî xortekî kir, ku li  
go eyek salonê qehwe vedixwar û li tablo ya ku  
bi dîwarê beramberî wîve helwestî bû  
dimezand .

belê, guman di dirv û nî anên wî de nînin,  
ku kurd lawê kurda ye, brihên wî sitûr, bêvilek  
beranî, simbêlê bi ser lêvan de daketî, zengelok  
wek hêkek mirî kê di gewrîyê de belû, ji

rûni tina wî diyare, ku ne kine ne dirêje, bi co î  
û dev li kenî, min berê xwe dayê, ewjî aqedar bû,  
ku ez ber bi wî ve diçim, bi du çavên tije pirs li  
min dinerî, : êvar ba .. ( ak am ler .. merheba  
..mrheba..) û bi germî destê min dihejand, ez hîn  
di bin bandora adî ya dîtina wî de bûm û silav  
vegera wî, ne bûn sedemê xwe jê vek an dinê, lê  
gava min xwe pê da nasîn û min jê xwest ku ez  
jî wî nas bikim, dîsa ( ben kurtim ) û ( sen ) û  
çend peyvên ku ( ler ) bi dawî ya wan di ketin,  
ez hîç tê negihi tim ku çî dibêje !! mîna ku  
ivekê li nav çavê min bide, ez nuh ji benca  
dil adî ya dîtina wî hi yar bûm û di cîhê xwe de  
tevizîm, xwêdana ermezarî yê bi enî ya min  
diket û min nema dizanî ezê çî bikim, ez bi kerb  
li hevalê xwe vegeîyam .

- Tu tenazî yên xwe bi min dikî, çawa ?

- Çima ?

- Te got kurde ! û ew jî bi tirkî dipeyive..

- Yê min çîye birê min..? wî got ez kurdim.

Pencên kerb û ermî yê, gerdena min  
digvê in, bêhna min ji ber diçike û cênîkê min bi  
zirzî lê didin, serpehatî yek ku mirov ji bagera  
wê erpeze dibe û nema ti tekî dibîne, yan jî  
mîna ku merov di xewnek ne xwe debe û ew bi  
xwe jî nizene ku xewne, yan jî rastî ye, gava  
hevalê min bangî min kir ,, bi kude ,, min nuh

zanî ku ez bê hi î xwe dadikevim jêr ! bi hestekî  
birîndar ,, ezê herim wergêrvanekî bînim da ku  
ez û lawê netewa xwe ji hev fêm bikin .

### BÊHNA LA EKÎ

Di pencerê re li kolanê dimeyzîne,  
lawikê çixare-firo ne xuyaye, vedgere xwe li  
ser textê razanê dirêj dike, text morîstana  
gêrîkaye, hedana wî nayê, hinavê wî dikele,  
hest dibe ku ta girtî ye, la ê wî ji ser û pa  
dilerize, serî bûye deryake har bûyî, pêlên  
hizran, yek hiltê û yek datê, dil jî bi hêrs lê  
dide, tê ku sênga wî bi perçivîne, xwe bi çep  
û rast de werdigerîne, tîrên po manî û guneh  
karî yê, wî dorpêç kirine, hilm û bêhna wê,  
bêhna xwêdana wê, hîn jî di bêvila wî deye, di  
gewrî ya wî deye, ji hinavê wî difûre, bêhna  
xerzel û barûdê ye, tê ku ver e .

Li bin Dû ê, ava cemidî gelekî pê  
xwe e, hilm bi hilm, bêhna wî tê ber û serî  
pêre sivik dibe, lê la ê wê yê reng genimî ji  
ber çavan naçe, wek marekî nîv-rojên germ,  
bi hêrs hêrî î wî dike û xwe li la ê wî di alîne,  
ti t namîne ku tazî ji ser okê bireve" ev çi  
raze ? ma ev cara yekeme, ku tu la ekî tazî

dibîne ? min gelek la dîtine û ez bi gelek  
la an re jî razame, lê çi ji wan nayên ber  
çavên min, hemî ji bîr bûne, ji bilî wî la î, yê

di wê eva havînî de, ew bi tenê tim tê ber çavê min, wê hingê em çendî bê gunehbûn, pi tî ku em zarokên gund, ji lîstikan têr bûn û vegeerîyan mal, berî ku ez têkevim nav nivîna xwe de, min nivîftî yekî sor li ser derdîlkê kûpê avê dît, ez jî gelekî tî bûm û di cîh de hizrek eytanî li serê min da, ku çima ez dernakevim banê xênî . ?

li ber ba yê hênîk, min dîlimekî mezin ji iftî jêkir û bi co gezek lê da, geza duda, bi irîna avê re, nerînê min çûn ser hev oya pa îna, ya cîranê me, ku tije dêlî yên tirî û darên hinara bûn, la ekî tazî di hîve-ronê de, bi dewla av ji bîrê dik and û bera birkê dida, "yadêê..! ev çîye ?!" ez di cîhê xwe de tevizîm, " ev pîrhevoke ?!" û nerînên min bi wî la î ve hatin girêdan, lê ez nizanim min çima ne kir qêrîn, yan jî xwe di xênî wernekir ? pi tî ku çend dewil av bera birkê da, ket nav de û wek masî yeke zîvîn xwe li ser pi tê dirêj kir, vêca nav ran û sênga xwe mist dida, mîna ku ava sar pê xwe bû, bînek ba di nav de ma, dawî rabû çû li ber misîn rûni t û her wekî ku destnimêj digirt !! ez dibînim dayik û

bavê min, cîran û gundî, destmêj digrin, lê min ne dîtiye çî kesî wiha kirî ye !! bi xwedê ev pîrhevoke, vêca ipya ava misîn bi ser serê



xwe de dadike û hêdî- hêdî ji ser bîrê  
vegerîya, " ewe !! cîrana meye !! " berî ku  
têkeve nav nivînê, bi kuxuka mêrê wê re, ku  
wek dengê çiftakê teqand, ez ji cîhê xwe  
pekîyam .

dîsa di pencereyê re dimeyzîne, lawikê  
çixare-firo nabîne " axx lawiko ..! lawikê bê  
guneh, lawikê bê namûs, xwezî min te ne  
dîtiba û çixare ji te ne kirî bana, min çima ne  
lezand û karê xwe zû çare ser nekir ? eger  
min çend quri ên zêde dabana, ezê niha li  
mala xwe bama, lê dilînî yên min tim zora  
min dibin, destê min ji dost û hevalan ne  
dibû, vê wêrana paytextê, çi qas xelkên  
devera me, têde winda bûne ? min gelek ji  
wan ji bîr kiribûn, li vê hefte ya bûrî, her rojê  
ez hindeka ji nû dibînim, karê ku ez pê  
hatime, çi nemaye ez ji bîr bikim ! gerek min  
zû kirba .

doh min ji Ferhad re got : kurikek ji  
bajarê me, pakêta li ber derê hotêlê difro e,  
"ne tenê pakêtan difro in, her karî dikin, çi  
kar ne maye ku mêr û jin û zarokên devera  
me nakin, heta bi eba û fistanên ku diçin  
welatên Petrolê, hemî ji nav destên jin û

keçên me têne der, seyir nemîne ku hin mal  
hene " wî karî jî dikin !! "

ez vê sibehê, ji wê tare ya dûr, ya ku li  
rexê bajêre, vedgerîyam, ez dîsa pêrgî wî  
bûm.. marboro .. kênt .. winiston .. wey ! bi  
xwedê ewe : kuro qey tu li cîhekî ranaweste ?  
vêca tu li vir çidîkî ?! " apo mala me li vê tarê  
ye .." mala we ?! û bi destê min girt " wer  
heydê derbasbe, mane tu ji bajarê meye ? û te  
nema dikarîbû xwe jê rizrar bikra, bi vebûna  
derî re, jinek bedew pê ewazî li te kir û gava  
derî hat girtin, hûn herdû bi tenê, te hîn jê ne  
pîrsî bû ku jina kê ye, te xwêdana xwe  
vedimalt, û wê jî weke alûreke perî rengîn, li  
dor te fikir wîçe wîç, te piyalek av xwest û li  
tevgerên wê yê ne dirist agedar bû , ku bê  
xwe parastin, bizav fikir ku te ji ermî ya te  
derîne, " qey mêrê wê ne li male, ez çima  
ranabim ? " ( tê çi vexwe ..? qehwê..çayê ..? )  
" kuro bila nêta te zelal be, belkî jinik  
ne ji wanê ku te bi wan bihîstîye, ev pê ewazî  
ya germ, dibe ku ji bêhrîkirina welêt be," û  
gava ji pêjgehê derket, bêhna wê ya xwe ,  
berî wê li bêvila te da, fistanê xwe jî  
guhertibû, Robe yekî gul-gulî li xwe kiribû û  
bi kovkên wî, ji nîvê jêrîn de vekirî bûn ! û  
çîmnî reng genimî di nav re xuya dikirin, berê  
xwe dabû te,  
bi awakî balkê qehwe

vedixwar û her ku fincan datanî, bi kovkek  
dîtir vedikir ! vêca Kelsonekî re , di nav ranê  
wê re xuya dikir!! " seyir nemîne ku hin mal  
hene, wî karî jî dikin " taya fedyê bi gerdena  
te girtibû, te nema dikarîbû serê xwe rakra,  
"qey tu bi a î hatî ye vê derê ? "

vêca ilfî tazî li ser kenebê dirêj kirî  
bû ! tu çav girtî ji cîhê xwe pekîya, lê berî ku  
tu derî veke " bi xwedê tu ne zilame " cênîkên  
te bi zirzî lêdan û tu bi hêrs lê vegeerî ya " bi  
xwedê ku tina vê pû tê helale " û xewin bû çî  
bû ez jî nema zanim, gava min çavên xwe  
vekirin, min dît ku ez jî, tazî di himbêza wê  
deme..!!

gelo wê jî opa gunehkarî û po manî  
yê, di çavên te de dixwendin ? ku vêca dev bi  
çîroka kurte jîyana xwe kiribû û hêsir di bere  
dibarandin " bênamûs lawê bênamûsa bû, em  
wê salê nih ji malê cihê bibûn, me rênçberî ya  
pembû li ba wî dikir, wê salê pêde mîna sehê  
birçî, li dor min digerîya, lê min hîç xwe ne  
sipartê, ya dinî salê min got : kuro em li ba vî  
bê namûsî rênçberî yê nakin, lê li çî cîhê din  
bi dest me neket, vêca giha armanca xwe û  
pi tî ku ji min têr bû, dawî bera me da " û  
mêrê te jî, mîna gelek karkerên bajêr, bê kar  
ma û hûnjî tevî karwanê koçbera bûn û hatin  
paytextê .

hîn jî ten e pirsî bû, ku mêrê wê kîye û  
çi karî dike ? û gava ku navê wî got, mîna ku  
birûsk li ber çavên te bijene, tu ji cîhê xwe  
pengizî, li qonaxa xwendina amade yî, hûn bi  
hevre bûn û ew ji te jîrtî bû, lê ji ber ku bê  
nasname bû tim digot : xwendin ti nanî nade  
min, ez di welatê xwe de biyanî me , û te jê  
bihîst, ku ji berî sê mehan de, li ser kar, di  
avahî yekê werbûye, dest û pê yekî wî  
ikestine û niha di wê jorî ya dawîn de, di nav  
nivînê deye...

tifû li vê serdema pîs, oxx..! bêhna vê  
bê bavê, wek jehrê di hinavê min de digere,  
ez ver îyama wê çi ba ba ..

### BENDEWARÎ

Îro jî ne hat ....!! ma soz dabû ku wê bê ?  
na..! dilê min wiha lêdida, roj ba dilê te,ku dilê  
kê çi awaz lê bi dana û ew awazana bibana  
govend û dîlan, dêmekî wê axîn û keser ji jîyanî  
hilatana .

Û axx ..! ji axîn û keserên wê, vê kanî ya  
keseran di dilê min de der kirî ye, bi ev û roj ez  
bi kesera wê me, vê bi carê ez ji jîyanê der  
kirime û min kirî ye dîlê evîna xwe, hi û dilê  
min revandî ye û bêhnek bi tenê jî bê wê naçe û  
nayê, her gav û dem sîtavê wê li ber çavên  
minin, belê carna dighê wê rade yê, ku ez li çi

dinêrim, ez wêne yê wê di wî ti tî re dibînim ! ez êdî bi xwere dipeyivim, bi xwere di kenim, vêca ez di tirsim ku navê dîhin bûnê bi dûv min bi keve, wê rojê li ber neynikê min cilên xwe li xwe dikirin û ez bi xwe re di peyivîm, di gumana

min de ku ez bi wê re dipeyivim ! dîya min ji ni kave got: kuro ma tu bi kê re di peyive? tu dîhin bûye çi bi te hatî ye?! Ez çendî ermezar bûm û ji wê rojê de, dîya min bi awirnî tije tirs û wate li min di meyzîne, ez çendî bi xwere dixeyidim, gazinan ji xwe dikim, bê sûde ye, gelo ez bûme mirîd û sofî yê wê û min ha ji xwe nine ? ez dizanim vê dema dawî, helbestên Cezîrî gelekî bi min xwe bûne û ez gelek mey jî vedixum .

Kovî yê ...! ev roja çara ye, çar roj û çar ev, li hemî dem-jimêr û kêlîk û xulekan, ez tême sotin û bendewarî heta gengî ? ... ez çima jê re li telefonê na dim? gelo wê niha li mal be? Dengê wê çendî êrîne, ti t namîne ku ez destikê telefonê bixum ! wê evê bi dengê xwe yê çivîkî, ez serxo kirim, çi nema ku ez herim li deryê wê bidim, û tim digot : bila bêhna te fereh be,, ez tême sohtin û ew jî bîn-ferêhî yê ji min dixwaze, bi rastî ez carna bi guman dikevim, ku ev tenazî yên xwe bi min dike, lê tim jî min digihîne vê bawerî yî : ku ji min pêve kes di

jîyana wêde nine .

Û ev bangewazî yên ku li ser wê têne  
kirin, ji bo çine ? ez hîç bawer nakim, ku  
nazdarek wekî vêya dest sipî, wê mêrê xwe

ku tibe, ti tê ku ez dizanim, jina sipehî, mêran ji  
rê dadigerî ne, wan serxwe dike, wan dîhin  
dike, lê ku tin ne karê nazdara ye, û ne jî ev yek  
di ferhenga mêbûnê de heye, ku radibe, rûdine,  
dipeyive, dikene, ji ser û pa mêbûn jê dirje .. le  
çawa dibêjin : çi dû bê agir nîne ? ev ti tekî  
siri tî ye, ji xwe jî, cîhê ku agir lê vêdikeve,  
mirov ji dûr û nêzik ve dûmanê dibîne, lê çi kesî  
nedîye ku wê agir bi mêrê xwe xist, yan jî wî  
xeniqand, agirê ku bi mêrê wê ketibû, ji ber  
xwe k bûna wê bû, ku beramberî vê xwe ik bûnê  
gelekî lawaz û dilxerab bû, û nikarî bû wê ji  
awirên dixsok û dilbijoka bi parasta, vêca bi  
nexwe î ya derûnê ketibû, ku di wê eva tarî de,  
li nav dehlê, xwe xeniqan dibû, vêca xweku tina  
wî jî bû guneh karî ya wê ..

Û xewna berî du evan ku te dît , tu  
çawa irove dike ? bi rastî xewnek gelekî bi tirs  
bû , di gel ku bawerî ya min bi xewna na yê jî ,  
lê ez hînî di lerizim, ji avjenî ya wê îngolê, bi  
dil adî ez bi nav pêlan de diçûm û peravê golê  
nêzîk xuya di kir , lê her ku min nêzîkayî lê  
dikir, perav dûrî min diçû !! lê ez bê zar ne

dibûm, min divîya ku bighêjim dawî , ji ni kave  
dengekî li guhê min vedeng da : bawerî bi avê  
nayê, av bê binî ye, gelekî pêde neçe !! ,, ez li wî  
dengî dizîvirîm, ku yara min li rexê din yê golê ,

ilfî tazî li ser latekê rûni tî bû, û bazikên xwe,  
her ji hev vedikir , ango : were min himbêz bike"  
bi kelecânî ez lê vedigerî yam û kêlîka ez  
diketim himbêza wê de , dibû hovekî dirinde û  
pencê xwe li gerdena min di aland û qêrîna min  
bû sedemê ku dayîka min di hewara min de bê ,  
ez dîsa çendî ermezar bûm...

Lê berdewamî bi vî awayî hetî ketî ye ? ê  
ka ezê çi bi kim ? ne bi destê mine... î ev.. î ev  
divê ku her ti t zelal bibe ...

## NOJDARA CIWAN

Sibeh tim sibehin û li dûv sibehan tim  
êvarin, roj dibûrin dibin meh û meh jî dibin sal û  
sal li dûv salê ji temenê mirov dixun û eve pênc  
salin, nojdarê, bedewê ku te nojdargeha xwe  
vekirî ye û di nav giranî ya sar-rojan de, tu  
jîyana xwe dibûrî ne, ku her hefte yekê tu sê  
Nexwe an li nojdargeha xwe nabîne..

Vê sibehê, waye dîsa çenteyê wê yê nojdarî  
yê, bi dest wê veye û bi gavnî terezûyî derbasî  
hindirê nojdargehê dibe, lê dîsa wekî her car, ji  
bilî rû yê berdestî ya xwe, çi nexwe a li salona

bendewarî yê nabîne ! bi serê lêvan, fincanek qehwe dixwaze û dikeve jorî ya xwe de .

Bi awakî hosta yî, da ku sorava lêvên wê jê neçe, firnî sivik li fincanê dide û destê wê diçe ser pakêta çixare yan, di gel ku li dîwarê himberî wê nivîsînek heye ,, çixare kê î n qedexe ye ,, û tim ji nexwe an re dibêje : çixare zîyanê li tendiristî ya mirov dikw , çixara nek î nin..  
Romana ku doh çend rûpel jê xwendî ye , hîn jî li ser masê raketî ye, devê romanê vedike, li rûpela ku gihabûyê, ji nû dixwîne, xêz li ber çavên wê , dibin hej û pej û tîp dibin mêx û hildifirin li nav çavên wê dikevin, bi hêrs devê romanê digre ( off ! ev çi jîyane ? xwezî ez kevanî ya malekê bama û ne girtî ya di nav çar dîwaran de bama, min ciwanî ya xwe pêkve di nav rûpelên pirtûkan de winda kir û dawî ez ne giham wî peravê kesk, min çend delîve ji dest xwe berdan ? ez ya ku wek gulek sor bûm, di nav keçên zanîngehê de û refên perwane yan li derdorê min dilîstin û min jî bi her awayî derî û pencere li ber wan digirtin ,da ku ji îrava min ne mijin, min tim digot : belge-name berî her ti tî û dawî bi ba tirîn pile min belge-name wergirt, lê ka min çi sûde jê dît ? min çendî xewnên gul-gulî di neynika vê belge-name yê re didîtin, ku wê pere tim li ber destê min pir bin û



ezê ji ser û pa di nav zêr û gewheran de pêçayî  
bim û ezê her bimînim ew sor-gula ge û wê refê

perwane yan, xwe li dor min bi sotînin, axx..! ez  
çendî ji ser xwe çûyî bûm ? û niha li vî bajarokî,  
ez ji bilî tozê û keseran ti tekî dîtir naki înim û  
çi gava ku ez li ber neynikê jî li xwe  
dimeyzînim, ez dibînim roj bi roj pelê dara  
ciwanî ya min zer dibin, vêca ez xwezî ya xwe bi  
Emokê tînim, ku emokê çendî dilge e, çendî  
wêreke û xwe î yên jîyanê bi dest xwe ve tîne,  
emoka nîv xwende, bo min bûye îretvan ( keçê  
nojdarê, pepûkê, jîyan kurte û divê ku li her  
warekî buharek hebe, xwe ji vî kakilê payedar  
derîne, hinekî gelêrî be, zava yên ku tu wan di  
xewnên xwe de dibîne, li vî warî nînin, xortên  
me hemî ne nojdar û endazyar û parêzerin, tu ba  
dizane, ku vê derê de vera axa û barkê û bacan-  
firoîa ye, ma çi bi dilgirtî yê min ve heye, ku  
mamusta yê dibistana seretayî ye ? bawar bike  
,wan kure-demên ku ez li gel wî di bûrînim, li  
jîyanê çi ti t jê xwe tir nine! û min hîç navê ku  
bêrîka wî gerim be, tenê min dilê wî yê gerim  
divê, ku ez serê xwe li ser sînga wî deynim,  
bikene pepûkê te xwe pi avtî ye, tu jî sibê nayê  
seyranê ? seyran ? belê , em komek keç û xort  
xwe amade dikin, ku sibehê herin seyranê, tu jî  
pantelonekî Cênz û bilûzakî buharî li xweke, wer

hinekî bêhna xwe derîne, û çv da min( wê xort  
pir bin )

Qey emokê divê, ku ez jî têkilî yan bi  
mamusta yekî re deynim ?! ez û ... û ev xortê  
caw-firo , yê ku ji zûde xwe ji bo te disotîne ? lê  
.. lê çi ? û ev xura ku bi ev pêde bi la ê te  
dikeve ? dîsa te vedgerîne dergi a serdema sinêlî  
yê, ku ji ne çarî destekî te diçe ser memika û yê  
din diçe nav ...

Bi zirzî radibe ser pêyan, diçe pencere  
ya li ser kolanê vedike, xortê bazirgan jî beram  
berî wê , mîna guldanka ji bîrbû yî , ku bê  
gurzek gul ge nabe, gava ku çavên wî bi çavên  
wê dikevin , wiha rû-ge dibe û girnijînek pan li  
ser lêvên wî rû dide, nojdarêjî digirniye û zû bi  
ûnde vedgere ..

Pi tî kurte demek benc bûyî , bê hest  
destê wê diçe ser pêûsê û li ser pelekê ji yê  
raçête yan dinivîse (tu jî sibehê nayê seyranê ?!)  
û bi mestî li nivîsa xwe dimeyzîne ..

## DI TARÎ YÊ DE

Ez hîn jî nizanim, ku çima andin dûv min û  
ez ji bo çi çûm ba wa ?! na .. ne wan andin dûv  
min , yên vê derê min andin ba wan .

Li wê derê pi tî ku( hosta yê mezin ) li nave min pirsî, awirnî tûj li min vedan " zimanê te dirêje ! wî Bibin . "

Di wê kurte dema dawî de, her çend rojan carekê dihatin, serê min bi pirsan gêj dikirin û ez nizanim çî di defterên xwe de di nivîsandin ? êdê ez jî, bi xwe bi guman diketim " gelo min ti tin kirine û hayê min ji min nîne ?!" ez bi xwe dizanim, ku ez ne wiha gelekî giringm, lê wan gelek giringî didan kesatî ya min , ez carekê pijiqîm nav rûyê wan " çîye ...? we çî ji min Divê ? ma hûn ji bilî min , kesekî dîtir li vî bajarî na bînin ?" bi rastî ez gelekî bi zirzî li wan rabûm, lê ez di wê bawerî yê deme, eger kî di ûna min deba wê wiha kir ba, pirsnî taybet ji min dikirin, ku mirov ji bersivdana wan ermezar dibû, mirovê ku piçek namûs pêre heba Wê ji hêrsa bi perçivya .

Cara dawî derbas ne bûn, li ber derî " hosta te dixwaze " û bi ûnde vegeerî yan . Gerînokên hizir û gumanan, mîxan bi mejî yê min de dikutin, roj bê renga û cîhan pêkve bê eles, ez birevim ? rev barê min giran tir dike, ez xwe ve êrim ? jîyana li pi t perdan û zindan wekî hevin, re -qîrên kolana, wekî maran xwe li pê yê min di alînin, gavek li pê , yek li pa û ev sergêjanî heta kengî .?

eqamek ku agir ji nav tilî yê wî jenî,  
hosta li nav çavên min da, mîna ku ji zûde , xwe  
ji bo pê ewazî ya min amade kiribû, wek bimbe  
ya ku mirov pêlêkê , bi min de peqî ya, ( hey seh  
..!! tu kîye heta ku tu wiha li peya yê min hêrs  
dibe ? ne ezê sitêrên nîvrojê pê te bikim ! wî  
bibin ..) û ji dawî de pêhêneke hî tirî li ranêmin  
da , ez bi dev de çûm , sere min li dîwêr ket .  
Dengê qêrîn û hewarê min naçin kesî û ne  
jî kes di gazî ya min de tên, tenahî dijwar û  
kujekê , iver hiltê û yek datê , tevzînok ji binê  
linga xwe davêjin koka mejî, devê min bin guhê  
min dipelîne, çav tên ku ji serê min bi pekin, lê  
gelekî dirêj nekir, mîna tavî yek buharî bi hatina  
hosta re, aheng zû ferikî...( pere bi tere hene hey

seh ..? ) û kertek di nav serê min de lêxist, ( tê  
sibê vê kertê di gel xwe bibe û here navendê. )  
heta bi wê higê jî, min hîn nizanî bû, ku vêderê  
axe û wê derê navende .

Û tarî yê ez xwarim, ev û roj bûne yek,  
tarî û tim tarî, ez çendî radizêm û radibim, tim  
tarî ye, ez bûme mûyekî zirav di nav tarî yê de,  
ez bi xwe jî nema xwe dibînim , ez dizanim mi k  
û kêzik jî di gel min dijîn, lê ez wan nabînim,  
eger ku min wan dîtiba, minê hevaltî di gel wan  
bikra, lê mixabin, ew jî dijminatî ya min dikin û  
her min digezînin, ezê di vê tarî yêde birizim û çî

kes min nabînin, ku min zanîba gunehê min çîye  
? aramî pêdivî bû, ku min xwe ragirta, lê min  
serkê î ya çete yan ne kir ye, min çi hewildanên  
wergerandineke le kerî ne kirine, Min belavokên  
qedexe belav nekirine, min kevir ne avêjtine ji  
minaran de, min tif wêne yên ah jî ne kirine, ji  
van pir wêne yên ku mirov li kîderê dinêre, li ber  
çava ne, ne jî min bi ser peykerên wî de mîz kirî  
ye .

Tarî û heta kengî tarî ? vê tarî yê ez  
pi avtim, û ez nema zanim ev çend roj û çend  
meh bûne, ku ez bi tarî yê tême i tin, ez  
dizanim rih û porê min gelekî dirêj bûne, xura

la ê min jî bê hedane û çî devera ku ez duxrînim  
, xwîn bi nenûkê min ve tîn .

Dtirsim ku ez di vir de lal bibim, ez çima ji  
xwere nastirêm ? bi dengê ketî û zimanekî  
giran, min carna ji xwere distira, berî ez bême  
girtin, min kurte jîyana nivîskarekî xwendibû, ku  
çawa di zindanê de bibû nivîskar û Romanên wî  
yên herî xwe , ewên ku di zindanê de  
nivîsandibûn, dêmekî ew nivîskar, ne wekî min  
di tarî yê debû û pel û pênuş jî li ba wî hebûn, lê  
yê min ne rohnî û ne jî mirovek li nik min heye,  
ku ez ti tekî jêre bêjim, yan ew ti tekî ji min re  
bi bêje, carna jî ew çîrokên ku li serdema zaroktî  
yê , min ji devê dapîra xwe, ji ber kiribûn, min

yeka-yeka tanînin bîra xwe û ji xwere digotin .  
Tarî tim ew tarî bû, çi wext bû, çi demsal  
bû, min nizanî bû!! Demek ji deman hilwe î yan  
bû, ez carna bi xwe ku tinê dihizirîm, lê ti tek li  
ber destê min tine bû, ne jî hêz di hinavê min de  
mabû, ku ez serê xwe li dîwêr bidim, bêhna min  
bi kotekî dihate der, carna ez bi guman diketim,  
ku gêrik ji bêvil û guhê min têne der, carna jî  
min digot, qey kurim dev û çavê min dixun û ji  
min ne dihat ez wan ji xwe bikim û gava ku  
ingînî ji derî hat, mîna ku ez ji xew hi yar bûm  
( rab derkeve hey ker !! )

Jorîyek ku dîwarên wê, bi qirêjê seyinandî,  
lampeyek lawaz bi zik banê wê ve, gurzek iv li  
wê go e yê, li go e ya din, maseyek toz-girtî û  
kursî yek li pa , zilamekî girdî çav beloq, di bin  
çavan re li min dinere ( hinder rêjke û ser masê jî  
paqij bike , ezê niha bêm )

Bilabe ezê rêjkim, gelo heye ku ez dîsa  
rohnî yê bibînim ? ez bawer nakim ku wê rok li  
ezmana mabe, gelo niha li derve, eve yan roje ?  
ez nizamim çima girtî yan dixin jêzemînan de ?!  
û ewî bêbavî çima wiha li min dinerî ? dihat ku  
ver e, qey ez gelekî bê mirêz bûme? neynikek li  
vir nîne, minê li xwe bi meyzanda, te Hîn xwe  
tazî ne kirî ye hey ker..!!

Sê zilam bi hevdûre di Kevin hindir , vêca

ev çine ? yek ji wan çû li pa masê rûni t û yekî  
ji ni kave debançak di nav cave min de teqand, :  
xwe tazî bike hey qewad ..

Tim sê pirs dubare dibin û ez jî li himber  
wan , tazî dilerizim, bersivên min jî her wiha  
dubare dibin ! li hev dinêrin û ji nerînên wan, tèn  
xuya kirin ( ku hayê wî ji ti tekî nîne !! ) kuro  
rast bêje hey ker,, û ivek sitûr li nav milê min  
ket, ,, axx,, û min nema xwe dît ..

Çavên min bi zor vedibin, ez dîsa di tarî  
yê deme! û la ê min ji ser û pa dijene axx ! milê  
minî rastê nalive û serê min pir girane, gewrî tèn  
min , kefek tal bi ser devê min dikeve û xwîn ji  
bêvila min tê " rab derkeve mi kê kadîne " dîsa  
ev dengê zivre, lê ka hêza ku ez karibim rabim?  
kabokê min pûç bûne, bi çepelê min digrin û  
beratekî min li dûv xwe dik înin , wek kîsekî  
gemarê, heta ku min dighînin kolanê ...  
eve..!! bê eve, ronahî yên kolana  
pêketîne, û ev gulîstana sipehî li himberî vê gova  
pez çî dike ?! jin û mêr, ji ser maseyan ti tèn  
cemidî vedixun û zarok li derdorê wan, li bin  
rohnî yên rengîn dilîzin, ax ! jîyan çendî xwe e?  
Tenik-bayekî havînî rûyê min dalêse û pêlên  
derd û kula, di dilê min de tev radibin, ew girî yê  
Ku demek dirêj, min di hinavê xwe de, bend  
kiribû, dihat ku bi yek pêlê re di çavên min re

birje .. de bigrî ..bigrî ...

EVA SIPÎ

dêmekî tê sibehê derkeve lawko ? tê ji  
sibehê de serbest be, wê serbestî yek xemgîn be,  
de jîyan li hêvî ya te ye loo , jîyan di wê eva  
sipî de bi dawî bû .

Ax..!! ji bê dengî ya wê eva sipî, evek ji  
evan cihê bû, him adî û him jî in bû, berfê  
xalîçe yek sipî li rû zemîn raxistibû û bejnên  
daran bi kincên bûkan xemilandî bûn, ez jî bi  
dilekî tije hêvî , li nav rez û li bin wê dara gwîzê,  
li hêvî ya yara xwe bûm, ku bihata mine bi destê  
wê bigirta û bi revanda .

Xwedê mala te wêran bike – ser mezino –  
te serê xwe ji yê cangakî jî hi ktir kir û tu bû  
kelem dir ê ya ahî ya min de, ez nizanim min çi  
xirabî bi te kiribû, ku tim te dil-re î di gel min  
dikir ? ji serdema zaroktî yê de, kîna min di dilê  
te debû, li dibistanê ez ji te jîr tir bûm, di rêza

xwe de, ez tim yê serkeftî bûm, dihat ku tu min  
bixwe û di lîstikan de jî, ez tim serkê bûm, di  
goga lingan de û di hemî lîstikên dinde jî, ji  
lewra te tim xwe ji lîstika vedik and û di bin  
çavan re li min dinerî û dema em bûn xort jî,



dîsa min ji hemî yan bêtir bala keçikan dik and ser xwe, ne tenê bi bedewî û bejin û bala xwe, belê bi çalakî û têkelî yên xwe jî, bi nî ana ku xû ka te ya sipehî, tenê ez ji nav xotên gund hilbijartim û bû dilgirtîya min û sê caran ez dihatim min wê dixwest, lê te hersê caran jî xwestekê min beravêtî dikirin, ji neçarî bû, me soz dan hev, ku di wê eva sipî de , em berê evîna xwe bi revandinê hilînin .

eva dirêj bi giranî dibûrî ya û çî pêjin ji yara te ne dihat, dilê te jî wek çixare yên ku te pêdixistin, wiha disotî ya û her ku ev zîz dibû, zûrîna guran ji çîya yê rajorî gund, bê dengî ya evê diçelqandin, hingê deng bi kûçikan jî diket, mîna ku tîrên tirsê, xwe li hinavên wan jî didan, bi harî li derdorên gund direyan, her wekî bi kewtîna xwe, gef li guran dixwarin, daku nêzîkî gund nebin, bavpîrê min tim li demsalên sivistanê digot ( evên wiha sipî, evên gurane û ev-re ên ba û baranê, evên dizane.. çima kalo ? ( kurê min li serdemên berê, di çaxa me de, ku Berf wiha diket, nêçîra guran li çîyan dijwar

dibûn, ji lewra dadiketin nav gundan û hêrî î govên pez dikirin û di evên barove yan de, diz dihatin dizî ya pez û dewaran, vêca kesên xwedî tari , heta bi sibê tivingên wan di dest wan debûn û hi yarî di kirin, lê ka niha ne pez û

dewar mane, ne jî gur û diz mane .)  
Lê tu di wê eva sipî de, gur bû yan jî diz  
bû? ez ne yek ji herduwan jî bûm, ez bendewarê  
kevoka xwe bûm, min divîya ez dawî yê li kul û  
keseran bînim, dawî yê li hêsiran bînim, ku  
hêsirên yara min dibûn baran û civanên me il  
dikirin .

Sermezino .! eger ku min zanîba, te wê li  
male girtî ye û tu bûye dergevanê derî, minê ji  
êvar de, hatiba fî ekek di serê te de vala kirba,  
qey bira jî navê revandinê girane, ku bavpîrê min  
digot ,, xwedê bi sere kesîde nine ,, lê xwedê  
ahid be, min ne dixwest ez vê yekê bikim, ji  
neçarî bû, min jî dixwest ku ez bi çepik û sitrana,  
bi govend û dîlana, yara xwe bi guhêzim, lê  
xwedê ji te re ne hêle ser mezino ..

Berbangê jî lêda û pezkovî ya min ne hat,  
û ew axîna ku ji kev ika dilê yara te hate der, di  
wê berbanga sipî de, gelo tê ji bîr bike ? na..naa,  
û ne jî ew xwîna sor ya ku ji bin pêşîra wê ya

çepê diherikî û li ser berfa sipî dibû gol, ji ber  
çavê min diçe, sed tif li nav çavê qederê be, ku  
destên qederê di wê berbangê de, ser mezino ji  
gule ya min parast, bi dilekî tije kerb û kîn, min  
berê debançe yê da nav serê wî, lê ez çi bikim ku  
gule çewt çû li milê wî ket ?! axx.!! ax ser  
mezino te jîyana min re kir... de tu jî razê

lawko, wa pasewan rohnî jî vemirandin, xêr di sibehê deye, xêr..! lê ku sibê ez derketim ...?

## BIRYARA DAWÎ

Pi tî ku civatê limêja E a kirin û yeka-yeka li dûv îmam, ji mizgeftê derketin, mele erîf dîsa wekî her car, xwe li dawîya hemî yan ragirt û ser di berde tizbî ya xwe dik and, lê gava xizmetkarê mizgeftê deng lê kir ( mele erîf..! rab ezê derî yê mizgeftê bigrim ! ) mîna yekî ku ji xewek giran hi yar bibe, devê mele ji hev çû û bi belengazî „çima qurban ? ez ji xwere li vê derê radizêm,, ( qurban vê derê ne xane, here li mala xwe razê, seyda hîç nema qebûl dike ku çi kes li mizgeftê raze . )

Mele tê gihi t ku ferman ya seyda ye û genge e ya vê mijarê bê sûde ye, ji neçarî kurkê xwe avêt nav mile xwe û bi kerb di ber xwe de digot ,, tu dibêjî qey mala dîya wane, heta bi mala xwedê jî li me qedexe dikin !,,  
Li der ve, bayekî kur ji nav berfa zozana tê û bi koranî xwe li bin guhê dar û dêwaran dixîne, kolan pêkve bê dengin, heta bi sehên beradayî jî, cîhnî germ ji xwere dîtine û têde nivîyane, mele  
bi hêrs û kelogirî, destên xwe ber bi jor vedike û

dizûre ,, xwedêyo..! ma min çî bi te kiribû ? ku te ez xistim tora vê bê bavê de, ezê niha li mala xwe bama , li nav zarokên xwe de û di nav nivîna xwe ya germ de bama, xwedêyo..! min ne xêr ji meletî ya xwe dît, ne ji jina xwe û ne jî ji zarokên xwe, ku ez li dawî ya temenê xwe, bûme ekalek kevnar û avêtî, li ser sergo yan, she bi ser de mîz dîkin ...,,

Mele bi xwe hi yar dibe, ku li nav goristana bajêre, li derdorên xwe dimeyzîne, ji bilî kêlên goran, ku bayê kur eqama li wan jî dide, ti tekî din nabîne, ji ni ka ve çavên wî bi ronahî yên bajarê Mêrdînê dikevin, ku wek gerdenî ya bûkekê, di himbêza çîya yê Mazî de di çirisînin, mîna korê ku rohnî bi ber çavan bi Kevin, kel bi dilê wî ket " çî xêr di vî welatî de nemaye, ya ba ewe ez ji van deveran birevim, eger ku ez li nav bimbe yan hatim ku tin, ezê ji vê jîyana teres riha bibim û eger ku ez bi pa sînor ketim, hema ez li ber derî yê mizgeftê parse jî bikim, wê ji vêderê çêtir be ."

Li vê dema dawî, jîyan gelekî bi jina mele xwe bûye, mîna ku barekî giran, ji ser milê hatibe hilaîn, wiha bêhna wê hatîye ber, bi ev û roj, ji cîran û zarokên xwe re dibêje " ma min

çî xwe î ji dest evê qirêjî dît ?bi ev û roj wek kunda bi ser serê min de dikir pite-pit, xwedê

bike ku ez yek car jê riha bibim . "

Li wê serdema ku mele melebûn û gelekî  
bi rûmet û rêzgirtî bûn, mele erîf, li gundekî ku  
meletî lê fikir, ev jina xwe ya sipehî, ji nav  
keçên gund hilbijart, lê pi tî kurte demekê jinik  
jê veciniqî, " li destpêka zewaca me, min rojekê  
jêre got : mele min bêhrîya mala bavê xwe kirî  
ye, ezê herim serdana wan, " awirî xencerî li  
min vedan " tê herî çî ?! mala bavê xwe ji bîr  
bike, ez bavê teme û dayîka teme û mêrê teme û  
hew ...!! " û ji ber bê cirrî yê wî û têkelî yê ne  
xwe , di gel gundî yan, em ji gundekî diçûn yekî  
din, dawî ew jî tê gihi t, ku ji karê meletî yêre  
nabe, vêca me bar kir em hatin bajêr ."

Li bajêr mele barê jinkê giran tir kir, û  
jinik li ti tnî wî, yê nih aqedar bû, ku mele ne  
tenê dil-xirab û pit-pitokî ye, belê destgirtî û  
çikûse jî " heta ku em li gunda bûn, em li ser hêk  
û mirî k û xwarinên gundî yan dijîyan li vê derê,  
carna ku min jêre digot : mele tu jî carna wek  
Xelkê, kîlok go t, hinek fêkî, di dest xwe re, ji  
zarokan re bîne " bi zirzî li min vedigerand : te li  
mala bavê xwe tim go t û fêkî dixwar ne wisa..?

Jinikê jî bi êwe yê xwe yê taybey,  
cengek derûnî di gel wî fikir, tim tîrên tirs û  
gumanan di cergê wî de diçandin, mele jî heta ku  
karîba xwe ragirta, ji alî yê birçîbûna la ê wê ve,

dan û sitendin di gel wê ne fikir, lê ku nema bi xwe dikarîba, ji nû di nav nivînê de, bi lava ya li ber wê digerîya, mîna sehê birçî, çi nedima ku wê bixwe, jinikê jî la ekî bê gîyan dispartê û di dilê xwe de, lavij ji xwedê fikir, ku çi ziryet bi dûv vî melayê kinoj ne Kevin, lê dijî xwesteka wê, her du salan carekê, zikê wê dinepixî û dûnde yekî nuh ji mele re çêdibû .

Berî çend salekî, dema ku telfizyon ketin malan de, û çîrok û çîvanok ji ber me, dayik û dapîran girtin, û bi çîrokên xwe yê balkê , bêtir bala zarokan dik andin, min dîsa bi sitû xwarî jêre got " mele tu jî telfizyonekê ji zarokan re bîne, zarokên me, êdî çavên xelkê derxistin, tim li nav malane, mîna ku min tif kiribe nav riha wî, ji cîhê xwe çeng bû " çawa..? vêca telfizyon ji min kême ! qey te divê tu mala min bikî kerxane"

Mele tim dixwest her ti tî bistîne û ti tekî ned û tim jî digot " mal û zarok rew a jîyana vê dinyê ne ! " lê heta ku cilnî nih di cejnan de, ji zarokan re fikirî, porê serê wan hemî radikir û ji

alî yê cilên jinikê ve, tenê li xêlî û eba ya wê miqatebû .

Di bin bandora peyv û girî yê jinikê de û hest bûna kêmanî ya her ti tî, ku çavê wan tim li dest û malê cîrana bûn, kurê mele yê mezin, dest

ji dibistanê berda û dest bi kar kir, berî her ti tî  
roja ku telfizyon anî malê, xû k û birayên wî  
gelekî dil ad bûn, lê êvarî gava ku mele hat  
Malê, ahengek ji er û pevçûnê li dar xist, cîran  
pêkve li wan kom bûn, ji ne çarî, mele ev  
serhildana yekem, di mala xwe de, wek jehrê  
daqurtand, lê pi tî sê rojan, bimbe ya kerba  
telfizyonê, di serê jinikê de peqand, bi hêrs lingê  
xwe li te tê da " qey ezê timî ji tere bêjim, cila li  
hew ê ne o ? çîmên te heta bi kabokan ji  
dervene," û pêhnek li jinikê jî da, " ez dizanim  
wê ev telfizyon mala min bike kerxane, bi  
dijûnên mele re, kurê wî ji hidir derket, " tu ji  
riha xwe ya sipî jî fedî nake ? tu jî cil o ye kê jê  
re bikire, li ber te tê rûnanê, "

Ji wê rojê û virde, jinikê êdî nema hêrs  
bûna mele di pijirand, berî her ti tî, nivîna xwe ji  
ya wî cihê kir, û heta bi xwarinê jî, nema di gel  
wî dixwarin, mele ji êdî cîgehê xîwarin û razana  
xwe nas kiribû, ji alîyekî de, ji vê sîstema nuh  
razî bû, ku xwestekên malê û zarokan nema jê

têne xwestin, tenê bi nav mabû " zîlamê malê"  
Lê ji alî yê birçîbûna la ê jinikê ve, pir di gazinî,  
gelek caran bizav dikir, ku dîsa xwe bighîne  
jinikê, lê bizavên wî beravêtî dibûn, dîsa dev bi  
dijûna dikir, " ez dizanim tu çi pû tî, ez êdî bê  
dîn û bê îman bûme, ez ji xwere bizewicim, "

Mele du sê salan, bira çavên xwe li zewacê digerland, lê westana temenê xwe, hemî di ser hev xista, qelenê jinekê ne tanî, û gelo vê jina nuh ya ku bîne, wê ji ya berê çêtir be ? nemaze ev niv ê telfizyona ? ya ba ewe ku bixwe û vexwe û li dawî ya temenê xwe, bi bê baveke din re, xwe rezîl neke .

Berî çar mehan, mele dîsa da zîtoka, roja ku keça wî xwe amade dikir, wê biçya paytextê, ji bo ku li zankoyê bixwenda, mele har bibû û dizûrî ya " hahoo..!! wê çawa keça min bi tenê here paytextê ?! wê dawî avis Bi ser min de vegere " lê hewar û zûrîna mele, mîna fî ekên ku di govendan de di teqin, wiha bi valahî yan de Diçûn, çi kesî guh lê ne dikir, di wê govenda er û pevçûnê de û li nav koma cîranan, mele sûnd xwar, ku nema li vê malê dimîne " gelî cîranan.! Hûn ahid bin, ji nihade, ev keç nema keça mine , ez jê bêrî me . "

## KEPEZÊ XEWNA

Kepez, yan jî " kepezê kîkan " ev çîya yê biçûk, ku bi dirêjahî ya dîrokê, li vê de ta dûz û fireh, wek kuvarkekê li bin lingê Toroz daye der, ev singê ku li vê de tê hatî ye kutan, çavdêrî ya gelek bûyerên dîrokî kirîye, û gelek buyer li ser



pi ta wî bi xwe jî pêkhatine, gelek mîrne î n li  
derdorên wî avabûne û herifîne, lê tim û tim ew  
Wek xwe maye û wê wiha bimîne .

Li vê serdemê jî, kepez çavdêrî ya du  
bûyerên dîrrokî kirine, dibe ku ji hemî bûyerên  
bûrî cûda bin, gava ku sînor di navbera kepez û  
toroz de hate danîn û toroz ji wî alî de bi tîlên  
sitirî û bimbeyan dorpêç bû, ji vî alî de jî,  
kemerek qirêjî li newqa kepez girêdan, lê hîn jî û  
di gel wisan jî, ev dilê bi çûk, wek zarokê ji dîya  
xwe cihê bibe, ew li vî alî û toroz li wî alî, bi ser  
hev de dikalin .

niha jî li ber sîha xanîkekî, ji wan çend  
xanîkên li derdorên kepez, ku ji bo cotkarên

pembo, hatine ava kirin, hizirvan, yan jî wek ku  
bi kurtî dibêjinê " hizro " xwe ramedandî ye û  
çav li xew dihênije .

kalekî ji berfê, cil û bergên wî ji ser û pa, di  
gel gopalê di dest de û tizbiha wî, pêkve sipîne,  
tê li ber serê wî rûdine, : kurê min..! tu min  
nasdikî ? ez bavpîrê te yê yekemînim ! pi tî "  
lehî ya mezin " di hindirê ikeftê de, ji yê  
çîya yê Zagroz, ez ji dayîka xwe bûm, ji wê  
hingê û virde, keç û kurên min, li van herêman  
belav bûne, min gelek serkeftin û tîkçûn jî  
dîtine, lê ba bizanibe, jîyan xweragitine, ez  
dizanim, ji demek dirêj de, tu ji jîyanê bê zar bû

ye, lê guh bide kalê xwe, ezê rê yekê bidim be  
rte, ku tu giha dawî ya vê rê yê, tê bighêje ahî  
yê, kurê min, li rajorî kepez çemek heye, jê re  
dibêjin " çemê çar co " li drdorên vî çemî pir  
kavil hene, ku niha bi çewtî ji wan re dibêjin "  
kavilên gawiran" û ew gawirên dêrîn jî, bavikên  
tenî pê î ne, di nav wan kavilan de, sitûnek  
bilind û sitûr heye, sitûn xwar bûye lê hîn neketî  
ye, bin wê sitûnê bikole, tê kilîtek zêrîn bibîne,  
ew kilît ya degehê gencîne yên zêr û gewherane,  
lê hi yar be, bi destxistina kilîtê ne hêsane, divê  
ku tu bi raza sihrê zanibe, ya na, nifira ku li wan

kavilan bûye, wê li te jî bibe, lê ku tu bi jîrekî  
giha kilîtê, tê bibe ahê serdema xwe, te fêmkir  
kurê min ? û destê xwe li milê wî dide ..."  
hizro ji xew çeng dibe, çava li derdorên  
xwe digerîne, ji bilî çend têtî yan ku li ser coka  
avê perwaz didan, ti tekî nabîne, ji cîhê xwe  
dipeke û bi nav zevî ya pembo de diçe, da ku bi  
zanibe av gîhaye kî derê û dengê kalê berfê hîn jî  
di guhê wî de dike zingîn " te fêmkir kurê min "  
ev çi xewnê seyrin ku ez dibînim ?! wê evê jî  
dîsa min di xewin de di dît, ez li nav mêrgekê  
bûm û keçikek tazî bi gul û kulîlkan re sema  
dikir û çav dida min, lê çendî min bizav dikir, ku  
ez wê himbêz bikim, destnî ve artî bi guhê min  
digirtin û min bi ûnde vedik andin ! geh jî ew

destên ve artî, dibûn mar û xwe li çîm û gerdena  
wê di alandin ! lê çavên keçikê tim li min bûn,  
ku ez wê ji mara rizgar bikim ..

hi ê hizro, wek kewekî ji serî hildifire û bi  
aso yên rajorî kepez de bilind dibe. Bi serbestî  
têl û bimbeyan derbas dike û bê dijwarî li ser wê  
sitûna di nav kavilan de datîne, hûdî hêdî bin  
lingê sitûnê dikole.. wey xwedê yo!! Kilîta  
zêrîne ! ya kalê berfê ye, gicîne yên zêr û  
gewheran vedike, al û apikekî bi tayên zêr  
neqi andî, bi ser bejin û bala xwe de berdide,

taca gewher dide serê xwe û li eywaneke fireh, li  
ser kursî yeke sedefî rûdinê, ava gul û sêvan, di  
piyalên zîvîn de û li ser destên " keça mergê "  
tazî tîne li ber wî datîne, sîmfonî yeke dilînî bi  
destjenî ya ba sazvana dest pê dike, keça merge,  
li ber awazan, wek gul-lale ya bi bayê sibana re li  
badibe û ah hizro, destekî li newqa wê dike  
kemer û bi destê din, peyalên gulavê, bi ser  
memikên wê de dirjîne.. û bila Harûn ê re îd  
keseran bikîne .

dehnê êvarî, gava ku rok dadikeve  
xwarê, sîha hîm û latên kepez jî, pêre dirêj dibin,  
hizro jî mîna çikçikanên ku xwe davêjin ber sîha  
kevîran, ew jî niha, li ber sîha hev o ya ziyareta "  
êx " rûni tî ye û li Toroz di meyzîne . " toroz ..  
toroz ê bejin bilind,

rêbendê pû berî min  
bilindî ya te  
egerê ne dîtina mine  
bo çi deverên din  
tenê Mêrdîna min  
serê siba wek xiv e yek nazdar  
di himbêza te de  
dike dîyar...  
û dilê min li pa te evîndare toroz ..

apê Cimo tim dibêje : ku ne ji vî sînore bê  
mirêz û van bimbe yên genî ba, toroz vaye law,  
gavek cîye..! ku ez bi rev herim, ez têr narevim.!  
" ma bira wisaye êxê min ? û ev agirên ku niha  
li serê van çîyana vêketîne, gelo wê vê carê, tarî  
ya me rohnî bikin ? tu çi dibêjî êxê min? me tim  
agir vêdixist û biraderên me xwe li ber germ  
dikirin, me nêçîr dikir û wa dixwar, me tim  
dergehên dijwar vedikirin û wan tac didan serên  
xwe û dawî heta bi gundên me jî, li xwe par kirin  
û kula herî giran, ku bavê dilgirtî ya min digot "  
wehh..! em bira yê hevin "  
û dawî dilgirtî ya min jî da wan, êxê min ma  
bira biratî wihaye..?  
di vê dema dawî de, gelekê caran, kla  
hizro wiha radibe, mîna pêlên derya dilê wî  
diklên, pêlnî ji kerb û kînêne, ji bêhrî kirin û  
evînêne, wek yekî ku taa digre, ew bi xwe jî

nizane ku helbestan dibêje, yan jî bê hi î xwe di peyive, nema gelekî li mal jî rûdinê, ne jî guh dide zevî ya pembo ku bi rencberî têde kar dike, û çî kesî dibîne xewnê xwe ji wan re dibêje,  
- law, xewin xwedî yê xwe dikujin .  
-Kesê ku xewna nebîne, ew kes mirîne.  
-Xewin neynika hizên rojêne.  
- Kesên birçî û lawaz, xewna dibînin.  
-Xewnên te rehmanî nin .

-Xewnê te eytanî nin .

Û hew wiha bi vî awayî, serê hizro bûye dahol, û her yek ji hêla xwe de, gopalekî lê dide, hizro ji cîhana xwe ya siri tî derçûye, bûye dîlê xewin û xewnerojan .

-Ev dîhin bûye ! bê guman wê pîrhevokên kepez lê dane.. ti tê balkê jî ewe, ku roj bi roj, hevalên wî zêde tir dibin, kalekî dîrok nas dibêje " wê gelek bi nexwe î ya wî bikevin, navê vê nexwe î yê, jêre tê gotin " vîn "

ev bê denge û tava hevê bi ronahî yeke bironzî, Toroz himbêz kirî ye, keça mêngê, di hive-ronî de, li serê zinarekî rûni tî ye, û di bendewarî ya dilgirtî yê xwe de, porê xwe eh dike, bêhna gul û kulîlkan, bi bayekî hênk re, ji zozana tê û kesê ku ji vê hilm û bêhnê serxwe nebe ji xwe hi di serê wî de nîne .

Ji wê evê de hizro winda bûye û çî kesî pêjna

wî li navçe yê ne kirine, hin dibêjin : pîrhevoka  
wî revandine, ma we ne didît ku çi digot ?! hin "  
bê guman, wê li nav bimbe yan, hatibe ku tin " û  
hin jî " wê berê xwe dabe Ewropa loo..bi jîyana  
vê deverê nema dihat ser !! lê kalê dîrok nas,  
serê xwe dihejîne, ew dizane, ku wê gelek xortên  
din jî, li dûv wî herin, bi hêvî ya ku bighên wê  
kilîtê ..

- 1) nivêjek mestan e li dor gunbeda cizîrî vekolîn, Dr.Fazil Umer-  
2004.
- 2) xewnên tazî helbest, ruxu ê zîvar - 2004.
- 3) wexerek di nihênîyên deqî da/ rexne û vekolîn,yasirê Hesenî -  
2004.
- 4) biyavê xwandinê vekolîn, Celal Mistefa - 2004.
- 5) li ber derazînka têkstan/ xwandinên wêjeyî, selambalayî - 2004.
- 6) xwandingeha birisîkirinê çîrok, Sedîq hamid -2004.
- 7) hizir û dîtin/ hizir û rew enbîriya gi tî, Dr. Arif hîtu - 2004.
- 8) çend rêyek bo deqî vekolîn, Sebîh Mihemed hesein - 2004.
- 9) berperêkê winda ji jiyannama Selîmê esmerê çîrok, anwer  
mihemed Tahir - 2004.
- 10) çend xwandinek êwekarî vekolîn, star Elî - 2005.
- 11) janên sînahiyê roman, tehsîn navi kî – 2005.
- 12) Qîses min bîlad alnercis, hesen silîvanî, çape duyem - 2005.
- 13) gotarên rexneyî komele witar, ho eng êx mihemed - 2005.
- 14) geriyanek di nav baxê edebê kurdî da, Re îd findî -2005.
- 15) sotingeh/ roman, bilind mihemed - 2005.
- 16) siyapo ê zêmarî çîrok, Dr. Fazil Umer - 2005.

- 17) anoya hevçerix û çend dîtin/ siyar temer - 2005.
- 18) viyan di demekê jandar da/ roman, mihsin bidulerhman - 2005.
- 19) teknîka vegêranê di kurteçîrokên (fazil Umerî da)/ vekolîn, nefîsa Îsma`îl - 2005.
- 20) mêrî û kevok/ çîrokên zarokan, Dr. Ebdî hacî - 2005.
- 21) hejde çîvanokên gurga/ çîrok, b: Mihemed Abdulla (çapa diwê) - 2005.
- 22) rustemê zalê filklur, Dr. Arif hîtu (çapa diwê) - 2005.
- 23) ihîna çiyayê spî çîrok, nizar mihemed seîd - 2005.
- 24) cemiserê siyê kurte çîrok, Xalid Salih - 2005.
- 25) Ey roj neçe ava/ pex an, selam balayî – 2005.
- 26) ji rew enbîriya kurdî vekolîn gotar, nacî Tahaberwarî - 2005.
- 27) zarokên cîhana a tî û a opê vekolîn, hizirivan Abdullah - 2005.
- 28) Duhok di serboran da/ bîrewerî, Sedîq hamid- 2005.
- 29) cak dirêda û helwe andin/ vekolîn, Dr. Fazil Umer -2005.
- 30) dawiya ervanekî roman, Îsmet mihemed bedel -2005.
- 31) pêlên rexneyî rexne, nimet allah hamid nihêlî -2005.
- 32) dema hê ta giyanewer di iyan baxivn/ çîvanokên millî, w: Hicî ce`fer - 2005.
- 33) ber bi deqê xomalî deq û irovekirin, Îbrahîm Ehmed simo – 2005.
- 34) mêmêtîkis, ji hizirkirinê ta ku aydyolociyayê Dr.Fazil Umer - 2005.
- 35) kelitor.. Nasyonalîzim û erebkirin/ vekolîn, Ebdalnurî - 2005.
- 36) peyvên bê perde/ vekolînên rexna edebî, Ebdulxaliqsultan - 2005.

- 37) nivistin di çavên nêrgzê da/ helbest, be îr mizûrî -2005.
- 38)ji felsefa berxudanê helbest, remezan îsa - 2005.
- 39)ewê dijî hemiya/ kurte çîrok, Sebîh mihemed hesen- 2005.
- 40)nijiyargerî Dr. Fazil Umir - 2005.
- 41)bîst sal û êvarek/ roman, Sebrî silêvaneî - 2005.
- 42)nivêsin di navbera nivîserên xudawend û lêgeryan liazadiyê vekolîn, ho eng êx mihemed - 2005.
- 43)ji çîrokên millî yên filklorî cimîl mihemeid êlazî -2005.
- 44)cewahir Al-mubdeîn/ munaq at adbiye, Îsmayîlbadî - 2005.
- 45)dîmenên peçnî çîrok, kîvî Arif - 2005.
- 46)tîr ji kivana diwe iyên û ber têne min/ helbest,selman kovlî - 2005.
- 47)kevarekê rwîs/ helbest, ukrî ehbaz - 2005.
- 48)dewlet û iqeke kevna/ helbest, deyka daliyayê -2005.
- 49) evên bê xew/ helbest, beyar bavî - 2005.
- 50)azirandina bendemanê hizirivan - 2005.
- 51)çaxê roj dipeyvît/ helbest, emal akreyî - 2005.
- 52)dû çemkên havîbûn yaxîbûn/ emîn Ebdulqadir -2005.
- 53)rastî û talan, Sebhî Mirad - 2005.
- 54)deftera bê gunehiyê helbest, Ebdulrehman bamernî- 2005.
- 55)ziman û zimanvanî Ebdulwehab Xalid - 2005.
- 56)evîn, xem û mirin/ helbest, Teyib de tanî - 2005.
- 57)zindana biçwûk/ helbest, Ezîz xemcivîn - 2005.
- 58)A iq di beh teka yutubiyayî da/ helbest, mistefaselîm - 2005.
- 59)ezê di hembêza henasên te da/ çîrok, Îsmaîlmistefa - 2006.
- 60)roman li devera behdînan/ vekolîn, remezan hecî -2006.
- 61)raya gi tî, têgeh û pênasîn û guhorîn û pîvanazanistî vekolîn, mislim batêlî - 2006.



- 62)helbestên rengîn/ hozan, w: Tengezarê marînî -2006.
- 63)tevnkera kurd, hunermenda berze/ vekolîn,w:ms`udxalid gulî - 2006.
- 64)çapemeniyêt rew enbîrêt devera behdînan (1935 -2000) /bîblugrafiya, wesfî Hesên Ridwani-2006.
- 65) eva firî te revîn/ çîrok, Îsma`îl Sileman Hacani –2006.
- 66)gululka aloziyaî Xalid êalih - 2006.
- 67)nivêjeka baranê hozan, heval findî - 2006.
- 68)roj/ hozan, hi yar rêkanî - 2006.
- 69)A iq li jêr pira çînudê bilind mehemed- 2006.
- 70)derdê evînê nuvlêt, yunis ahmid - 2006.
- 71)efsaneya stiranên bindesitiyê nicîb balayî - 2006.
- 72)xewneka emirîkî, çîrokên Ezîz nesîn/ w: Xeyrîbuzanî - 2006.
- 73)hizirînek di zimanê kurdî da/ re îd findî - 2006.
- 74)xanî Mamostayê sêyemîn/ mem eref - 2006.
- 75) ji awazên ciwanîyê hozanên, nacî taha berwarî -2006.
- 76)pêdaçûnek liser hindek belgenameyên taybet bi kurdanive/ vekolîn, Dr. Selah hirurî - 2006.
- 77)me a bûkan/ hozan, hîvî berwarî - 2006.
- 78)ew zelumê digel xwe ji yek cuda/ ano, siyar temer- 2006.
- 79)pelên E qê hozan, diribas Mistefa - 2006.
- 80) evên sar/ roman, Hesên Îbrahîm - 2006.
- 81)hozan bo delalê hozan, Xalid hisîn - 2006.
- 82)balolka ekirê çîrok, hisin silêvanî - 2006.
- 83)heyranok nameyên evîndaran/ edîb Ebdullah -2006.
- 84)mirin di qi leya pad ahî da/ çîrok, mihsinEbdulrehman - 2006.
- 85)çîvanoka gayê sor filklur, cimîl mihemed êlazî -2006.
- 86)selwa hê belalîske/ helbest, luqman asihî - 2006.

- 87)bilîcan/ roman, perwîz cîhanî - 2006.
- 88)le`lîxana goveyî çîrok, mistefa bamernî - 2006.
- 89)veger roman, ahîn bekir suwerekî - 2006.
- 90)qedera min/ hozan, selman êx memî - 2006.
- 91)bêhn k/ fulklor, mihemed hesen binavî - 2006.
- 92)Armanc/ hozan, Sebriye hekarî - 2006.
- 93)bakurê dil/ hozan, dil a Yusif - 2006.
- 94)xewnek binef î çîrok, Esmet mihemed bedel -2006.
- 95)nihênîyên xameî hozan, sebrî nihêlî - 2006.
- 96)henasek di perstgeha `irê da/ xwandinên wêjeyî,selam balayî - 2006.
- 97) or ên Barzan/ hozan, heyder metînî - 2006.
- 98)e qa me çirayekê zerade tiye/ kurteçîrok, Îsma`îlMistefa - 2006.
- 99)tenhstan/ helbest, Kemal silêvaneyî - 2006.
- 100)Rostemê zal/ fulklor, cemîlê hacî - 2006.
- 101)miqalat niqdiye/ micm`et a-lkutab - 2006.
- 102)dîwana helbestan, Îsma`îl taha ahîn - 2006.
- 103)dev çi nabihîsin! / kurteçîrok, têlî Salih musa -2006.
- 104) eveka bê nivêj/ hozan, layiq cemal kurêmeî -2006.
- 105)paraduksîzim û têgehê wê di hozana nwîxwazakurdî da li devera behdînan/ vekolîn, Îsmet xabûr -2006.
- 105)dosiya Barzanî di sindoqa pîlayî ya stalînî da/vekolîn, wezîrê E o - 2006.
- 107)helebçe/ helbest, seydayê Kele - 2007.
- 108)çavên sîtavkê roman, tehsîn navi kî - 2007.
- 109)bakurê helbestê helbest, arjen arî - 2007.
- 110)geryaneka bê hode/ çîrok, nefîsa Îsmayil - 2007.
- 111)sure birîna eva min/ helbest, selwa gulî - 2007.

- 112) e iq di xilwegeha mirinê da/ helbest, a tî germavî- 2007.
- 113) sirudên rojihelatî çîrok, Celal Mistefa - 2007.
- 114) ariyana sînurên dûr/ helbest, Mes`ud xelef - 2007.
- 115) awazên xameyî lêkolîn û rexne, ni`metullahamid nihêlî - 2007.
- 116) beyta sîsebanê hizirivan - 2007.
- 117) ger tu mabaî hozan, selman êx memî - 2007.
- 118) le ê evê helbest, selam balayî - 2007.
- 119) dalehî yên kesekê bi tinê çîrok, Dr. Arif hîtu -2007.
- 120) çend hizirên rew enbîrî gotar, nacî taha berwarî -2008.
- 121) helkulîna zimanî vekolîn, Dr. Fazil Umer - 2008.
- 122) xewneka kîvî helbest, deyka daliyayê - 2008.
- 123) ji bo rênivîseka çêtir, Îsma`il taha ahîn - 2008.
- 124) petiromekirinagunehan/çîrok, mihsinEbdulrehman - 2008.
- 125) rojanên êtekî çîrok, adîb Ebidullah - 2008.
- 126) roj ava dibît da bihelêt/ helbest, Sedîq Xalid hirorî- 2008.
- 127) bajêrê dîna û çend çîrokên din/ karîkatore çîrok, têlî Salih – 2008.
- 128) Evîn u sitran, Helbest, Feysel Mistefa – 2008.
- 129) Xeyrî Ne`mo, Helbest, Guvenda jînê- 2008.
- ROJIN DÎROKÎ DI JÎYANA GUNDÊ ME DE ..... 3
- ALÛRA BANÎ ..... 13
- E TAREK NÛJEN ..... 19
- ERMEZARÎ ..... 25
- BÊHNA LA EKÎ ..... 31
- BENDEWARÎ ..... 39
- NOJDARA CIWAN ..... 45
- DI TARÎ YÊ DE ..... 51
- EVA SIPÎ .....59

- BIRYARA DAWÎ .....65  
- KEPEZÊ XEWNA ..... 73

\*\*

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

www.nefel.com

info@nefel.com

NEFEL

Kurê zinarê serbilind

1

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

2 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Kurê zinarê serbilind

SIDQIYÊ HIRORÎ

NEFEL

Stockholm

2002

www.nefel.com

info@nefel.com

3

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Sidqiyê Hirorî: Kurê zinarê serbilind

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com

info@nefel.com

© Sidqiyê Hirorî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-973195-6-2

Çapa kevin: Nûdem

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike

û di Internetê de bêxe malpera xwe.

#### 4 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Ev romana min diyarî ye bo dayika min ya pir dilovan

û bo canê babê min.

Pêşgotineka pir kurt

Min nivîsandina vê romanê di sala 1991-ê de bi dawî anîbû, lê ji ber  
egerên diravî ez neşiyam wê çap bikim.

Ez, her li vir, dixwazim bibêjim ko nameya li dûmahiya romanê cih  
girtî pêkhatiye ji naveroka du nameyên hêjayan Rêving Hirorî û  
Hikmet

Hirorî ko her di wê demê de di rojnameya Kurdistan Press de ya ko  
li

Swêdê dihate weşandin hatibûn belav kirin û name ji birayê min  
Fewzî

Hirorî re hatibûn şandin. Herweha ji bo alîkariya hêjayan Rênas  
Awdal,

Elê Belo û Fewzî Hirorî spas dikim.

Sidqî Hirorî

5

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

6 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

–1–

— Dê kî ve çin? bi erebî û bi dengekê xinzirî û bilind serbazî pirsyar  
ji

wan kir. Lê ji kî ve dapîra Zuleyxa û neviya wê Besna erebiyê dizanin!  
Ajoyê otomobîla pîkap, ya ko Zuleyxa û neviya wê li pişta wê siyar,  
bû

wergêr di navbera serbazên ereb û dapîrê de :

— Dê kî ve çin?

— Kanîmasê.

— Hûn ji kî ve tên?

— Ji Deşta Sêmêlê.

— Çi karê we li Kanîmasê heye?

— Birazayeka min miriye û em dê çin taziya wê.

Piştî bi silametî derbaskirina her zalgehekê, dapîra Zuleyxa qurçek  
li

tifa di gewriyê de asêbûyî dida û pal dida xwarê û digote Besnayê:

— Dê Besê, eve jî çû, ka li ya têt dê çî bi serê me hêt û dê çî pirsyara  
ji

me kin?

Ji Sêmêlê heta Kanîmasê ji pazde zalgehan bêtir di rêyê de bûn. Evca

were dil tena di wê rêyê de here û were û li wan her pazdehan te  
rabi-  
westînin û te bi pirsyara bializînin. Te bînin û bibin û weko tirî te li  
zirkê  
bidin, bes ji bona ko bihanekî li te hîlbêxin û ya din dê ew be ya dilê  
wan  
dixwaze, hizra dapîrê bi hindê ve mijûl bû.  
Li paşiya otomobîla pişt berdayî qute quta dilên wan bû. Tehirka  
tavê  
bû û pîkap gelek bi lez diçû, ba dişeqand. Ji ber wê lezê, bayî xwe bi  
hêz  
li navçavên dapîrê û Besnayê dida. Lewma Besanyê dersoka xwe ya  
rengîn û gulgulî weko dapîrê di bin guhên xwe re birbû û baş  
girêdabû,  
da ko ba pirça wê qijevij û belav neke.  
Qolekê otomobîla di ber wan re buhurî. Zîlên leşkerî bûn û hejmara  
wan ji sêzdeyan bêtir bû. Xuya bû ew ji devera wan dihatin û ber bi  
Zaxo  
diçûn. Piştên wan tijî tişt û mişt û kincir bûn. Xudanên tiştên jî li ser  
barên  
tiştan bû. Serbazan jî wesa bi lez li tirimbêlan dixurîn, ne ageha wan  
ji rê  
hebû neku kesek yan canewerek bikeve ber û ne jî dilên wan bi wan  
ke-  
san dişewitîn, ewên li piştên tirimbêlan li ser tiştan, ewên hêj rondik  
di  
7  
KURÊ ZINARÊ SERBILIND

çavan de zuhanebûyî. Yên ko hêj çavên wan li pişt xwe digeriyan û  
wan  
mîna tevrê Ferhadî gir û çiya kun dikirin û ya ko bi serê wan û Şîrîna  
wan  
hatî didît ve.  
Iraqê, ew bi darê zorê ji gundên bab û kalan rakirin û bi lez û bez  
nav-  
maliya heyî, tişt û miştên wan, havêtine ser pişt wan erebeyan.  
Her sê çî-  
war mal û tiştên wan di zîleka leşkerî de. Paşî û li pêş çavên wan agir  
ber-  
da gundên wan, berda xanî û dar û baran, berda darên sêvan û hemî  
fêqî,  
heta yên xêve jî ketiyê û gehiştîn.  
Besnayê gote dapîrê:  
— Diyar e ev mişext û derbider kirin?  
— Ma dê çî be ji bilî wê! Zordar e û ya divêt dike. Xulî bi serê me  
kur-  
dan werbû. Hema hindî min dîtî û guh lêbûyî her ya me koçerî bû û  
koçerî ye. Her rojekê em li dereka din û li bin sîvandeka din in û  
nahêlin  
em bo xwe li cihekî vehewyên û binecih bibin. Were li ser axa xwe  
der-  
bider û biyanî be!  
— Erê dapîr, tu dibêjî wecek di vê hatina me de hebe?  
— Kiça min, halê me jî bi halê vî xelkî û çî nema ye, ha em dê gehin  
binecihê.



— Lê tirsî min zalgeha Bêgova ye, neku li wêderê sergêjîyekê ji me re çêbikin. Xwe hema ew e zalgeha ji hemîyan pîstir. Dibêjin heta jinan jî tînin xwarê û seh û siya cil û bincilkên wan dîkin, neku kaxezek, tiştêkê qedexê di nav de veşartî be.

— Ma te nezaniye? Nê Hela Îsivî li wê zalgehê hat girtin.

— Hela Îsivî! Kengî ?

— Berî şeş heft rojekan. Dibêjin kurê wê, ewê li nav Qeşûriyan ji wê û babê xwe re nameyek hinartibû. Helê jî çûbû Kanîmasê bo ko tiştêkî ji wî kurê xwe bizane; ka di çi rewşekê de ye. Li wê derê niyasekî nameya kurê wê da destê wê. Piştî ko kaxez jê re tê xwendin û li şûna ko bidirîne û bavêje, têxe di berîka xwe de. Çepelên zalgehê kaxezkê di berîka fîstanê Helê de digirin.

— Ma tiştêkî wesa ko li ser bête girtin tê de hatibû nivîsandin?

— Ma dê çi ji bilî silavan û pirsyara saxî û silametiya dayik û bab û xizm û niyasan tê de be. Her çend e Hecî Îsivî digot ko kurê wî di kaxezkê de nivîsibû »Heke we divêt, werin vê derê cem min. Li nik me, nuke rehetî

ye«. Lê mihanekê weha biçûk bes e ko mirovî pê bidin girtin û rezîlkin.

Dema ew nêzî zalgehekê dibûn çavên dapîrê serevrazî esmanan dibûn

û nimnimek ji bin lêvên wê dihat. Piştî ko ji her zalgehekê qurtal dibûn,

## 8 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

wê hêv dikire esmanan û digot:

— Hezar cara şukur bo te Xudêwo, vê carê jî çi nehate serê me.

Çavên herduwan, ji Xîzava ber bi Bêgova, man girêdayî Zinarê serbilind. Ew Zinarê bi hezareha çîrokên evîn û berxwedan û xweragirtinê

di nav xwe de werpêçayîn. Dapîr, bi hizra xwe derbasî serê Zinarî bû.

Havîn bû, lê hîn keviyên befrê xwe bar nekiribûn. Gundiyan gelek berif

dakiribû kombefrê. Rêbasan bi terînî û mizetama xwe tama devê wê xweş

dikir.

Kaniyeka ava tezî li wir bû, dapîrê jî wekî giş bêriyan, bi lepan, av jê vexwar. Av hinda sar bû, xiyar di tezîtiya wê de şeq şeq dibûn.

Berêveyî Zinarî, pez li ber bêrê bû û şivan jî li ser berekî di navbera her-

du rêzên bêriyan, yên li hember hev de, mîna qiralekî rûniştibû.

Bêriya

rêya du seetan bi pêyan ji gundî bo cihê bêrê qetandibû. Ew li ber sîngê

şivanî bûbûn du rêzên beramberî hev û pez di navbera wan herdu  
rêzan  
de ber bi şivanî diçû. Her bêrîvanekê peza xwe jê digirt û didot û  
paşî  
berdida. Ya peza wê ji destan vedirest, şivanî serê wê digirt û  
vedigerand  
bo ber destê xudana wê.  
Her di wan gavan de dengê şivanî bilind dibe, qêr dike lavje û  
stiranan.  
Mil dihejin, xuryan berdibe pêyên wan, êdî bêrî hew xwe digirin û  
dibe  
sema û govend. Zuleyxa serçemkê dawetê digire û dişarîne. Kenî û  
tirane  
û henek û laqirdî bê dawî dimînin û wan çel û çiyayan bi can diêxin.  
Bêrî  
xwe ji bîr ve dikin û dereng vedigerin mal û li ber derazînkên pitpit  
li ben-  
da wan bûn ka çima ew dereng vegeeriyane.  
Dengê Besnayê ristika bîrhatinan li dapîrê piçand:  
— Dapîr te ageh ji xwe hebe em gehîştine zalgeha Bêgova.  
Li zalgehê û wekî hemû caran serbazan bi tivengên xwe yên lûliyên  
wan  
arasteyî hat û çûyîyan kirîn, rê li tirimbêlan girtibû. Tirimbêl bi xwe  
nikaribûn li nêzîkî zalgehê lezê bikin, ji ber ko li pêşiya her zalgehekê  
û ji  
herdu aliyan ve, bi dirêjahiya sê çîwar metran, astengên weha ji axê  
çêkirine ko çî otomobîl nikaribin bi lez li ser bajon û ji zalgehê û  
rawes-

tandinê baz bidin. Xuya bû ko ew gelek ji xwe ditirsiyan, lewma wan  
as-  
tengine ji wî rengî li ber zalgehan durist kiribûn. Tirsaw wan ew bû  
neku  
kurdek bi erebeya xwe, bi lez bihêt û narincokê bavêje nava wan  
û biçe,  
yan jî erzaq û qûtekê mişe bi xwe re derbas bike. Ji xwe, mebesta  
wan ya  
rasteqîne ji deynana wan zalgehan bi wî awayî ew bû ko hebûna  
xwe ji  
xwecihên Kurdistanê re biselmînin û bibêjin:  
— Ev em li her derekê hen e, hema hûn axiftinekê yan karekî li dijî  
me

9

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bikin, hûn bi silametî ji destên me qurtal nabin.  
Zalgeh bi xwe çeşnekê tirsandin û kontrolkirina xelkî ye, bo ko serê  
xwe ji bo yasa û rêdarên wan biçemînin, rejîmên welatên devera  
me we-  
ha fikir dikin, ev hizir di serê dapîrê re xulxulîn.  
Serbazan dapîr û Besna ji paşiya pîkapê înanê xwarê. Serbazekî  
pirsiyar  
ji şofêrî kir ka ew herdu jinên bi wî re, li sîngê tirimbêlê rûniştî kî ne.  
Wî  
jî bersiva wan da û got:  
— Eve jina min e û ya din keça min e, bi destê xwe nîşa serbazî dan.  
— Dê kî ve çin? serbazî pirsyar jê kir piştî ko ew jî peykirîn.

— Bazarê sêva ye, şofêrî welam da. Qewl e ez sêva li Mayê yan  
Kanîmasê bikirim. Dê çim sehkimê ka dê bi dest min bikevin yan na.  
— Çima jin û keç bi te re ne? bi torebûn serbazî got.  
— Ji bo hedarî û bona ko arîkariya min di barkirinê de bikin, eger  
hat  
û min kirîn.  
Serbazine din mijûlî erebeyê bûn. Dihilişkift, ka çî tê de ye. Eger hat  
û  
wan tişte dît û dilê wan çûyê, li cem wan çî ji wê hêsantir nebû ko  
ji xwe  
re hilbigrin. Ma zehmetiya wê çî bû; hema da bêjin ev tişte yê  
qedexe ye  
û na be tu bi xwe re bibî deverên li bin kontrola pêşmergeyan û bi  
wî  
rengî ew tişt dibû yê wan. Ma çî ji dest xudanî dihat, hema wî lêvên  
xwe  
ji serêk rabikirbûna û bigota na, ne weha ye, dê qontaxên tivengan  
daweşiyabanê û ew jî dê bi tiştan re biçûya. Li cem wan normal bû  
ko  
derewekê pêve binin û wî li atafekî bidin.  
Serbazek bi koma pirsîyarên xwe yên tamsar li dapîrê û Besnayê  
zivirî û  
di ber re çavekê xwe li Besnayê diniqand. Besnaya bestezman jî serê  
xwe  
çemand û êdî ne rakir heta zalgehê rê daye şofêrî ko neferên xwe  
bibe û  
biçe.  
Piştî ko otomobîlê daye rê û ji zalgehê dûrketî, dapîrê bêhna xwe

hilkêşa û destê xwe yê rastê bi ser dêmê xwe de anî xwarê û  
nimnimek jî

kir.

— Me şofêr wesa têgihandiye ko em dê çine Kanîmasê, baş e tu  
dibêjî

çi tirs tê de nebe em li van dera peyabibin û tu dibêjî ko şofêr çi şika  
ji me

nebe? Besnayê ev pirsyare ji dapîrê kir.

Dapîrê jî xwest Besnayê tena bike, evca gotê:

— Besê! di xema hindê de nebe. şofêr jî dizane em naçin Kanîmasê.  
Ew

jî xwelîpêwerekê wekî me ye û ma kî dibêje ew dê ji bo kirîna sêvan  
biçe

Kanîmasê! Kî nabêje wî jî mîna me karekê din heye, lê ditirse rastiye  
bibê-

je. Manê van dagîrker û çepelan em hînî derewan jî kirin.

## 10 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Hê gundên rex û rûyên cehdeyê nehatibûn rakirin. Dapîrê baş mêze  
dikire rêyê ji bona ko wî cihê ko dê lê peyabin derbas nekin. Wê ew  
rê baş

nas dikir, ew bi sedan caran tê re hatibû û çûbû û xelkê wan gundên  
ser

rêyê jî, yên hevjiyê xwe nas dikirin.

Nêzîkî gundê Girka bûn. Dapîrê ji Besnayê xwest ko destê xwe li  
camê

bi rex şofêrî ve bide bo ko otomobîlê rabiwestîne da ew jê peya  
bibin.

Şofêrî jî pîkap da aliyekê rêyê û rawestand. Du serbazên Iraqî wêvetirî

wana bûn, demê wana dît ko erebe rawestiya, ew ber bi wê ve hatin. Piştî

ko dapîr peyabû, wê destê xwe bire berîka fistanê xwe û kefîkeka wer-

pêçayî jê anî derê û gote şofêrî:

— Ezbenî kes û karên me li Girkan e û me li bere em biçin seredana wan. Digel axiftina xwe dapîrê kefîk vekir û pereyên qurmiçandîn xuyabûn. Çavên lêxurê pîkapê lê bûn, wî derfet neda wê ko qala pereyan

bike û yekser gotê:

— Baş e dayê, pereyên xwe rake û hûn bi xêr biçin.

Lê dapîrê xwe gîro kir û xwest kiriya otomobîlê bide û şofêrî jî dixwest

ew biçin hê serbaz vêra negehiştîn, lewma berê xwe da serbazan û got:

— Dayê! Pereyên xwe bike di berîka xwe de û pêyên xwe sivik bikin hêşta serbazên henê nêzîkî me nebûyîn.

Ji nû dapîra Zuleyxa berê xwe da wî aliyê şofêrî çavkiriye û mebesta şofêrî fêm kir. Ji xwe, dîtina serbazan bes bû ko dapîr bitirse.

— Yê parastî bî kurê min. Mala te ava, axiftina xwe timam nekir. Destê

Besnaye girt û sivik pêyên xwe dane rêyê.

Serbazan gazî kire wan, lê ew li pişt xwe ne zivirîn û xwe tê negihand û

xwe bi ser ve hay neda. Ji bona ko bela serbazan ji wan vebike, şofêrî pîka-

pa xwe ajot û bi rex serbazan ve rawestand. Xwest wan mijûl bike heta ko

dapîr û nevîka xwe berêveyî çiyakî dibin. Bi erebiya xwe ya şikestî silav

kire wan, xurtî li xwe kir û keniyek li ser lêvên xwe perçivand û destê xwe

yê rastê dirêjî çekmeçeyê rexê destê rastê kir, du pakîten cigareyên Bexda

jê derxistin û pêşkêşî serbazan kirin. Devên serbazan beşbûn, wan pakît

jê setandin bê ko peyveka spasiyê jî ji devên wan derbikeve. Li ciyê spasiyê, wan demildest pirsyarên xwe yên hişk û tamsar arasteyî şofêrî

kirin. Di ber re çavên wan weke gurgên birsî diçûn jin û kiça şofêrî.

— Hûn ji kûve tîn?

— Ji Zaxoyê.

— Dê kî ve çin?

— Kanîmasê.

11

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Bo çi?

— Demê sêva kirînê ye û min sêv li wê derê bazar kirine û dê çim sehkimê. Heke em pêkhatin dê barkim û bibim Zaxoyê. Dibe evro êvarî

yan subehî bêm ve. Çi pê nevêt, sêv digel min bin dê behra we jî tê de be.



— Baş e em dê subehî jî li vê derê bin, yek ji wan serbazan peyivî.  
Lê

berî seet çarî êvarî were çunkî piştî hîngê rê tê girtin û her kesekê wî wex-

tî hat û çûyê bike tê gullebaran kirin. Bo me sêvên baş bîne.

Destûr dan şofêrî bona ko biçê û çavên xwe berdan ve pey dapîrê û Besnayê. Şofêr ji cihê xwe ne livî, çunkî tirsîya ne ko serbaz bikevin dû

pîrejinê û nevîka wê. Evca xwe hebeka din digel wan mijûl kir heta ko di

qodîka milê rastê yê pîkapê de dîtî ko herdu jin berêve bûn û êdî nahêne dîtî.

Dil li şofêrî rehet bû, ji ber ko wî dizanî ko serbaz bi tenê bîsteh nakin berêveyî wî girî bibin û newêrin biçin nava gundî. Wê çaxê şofêrî xatra

xwe ji serbazan xwest û pêyê xwe yê rastê da ser benzînê û ji wan dûr ket.

Jina şofêrî serê xwe hijand û got:

— Ho Xudêwo! dê kengî bela van serbazan ji me vebe?

12 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—2—

Kabaniya wê mala dapîr û Besna lêbûbûn mêhvan gote wan:

— Hema bextê we yê hosa ye, heke her roj vê demê gundiyên we diyar

dibûn û qolên wan ber bi gundî diçûn. Eger tişteke wan ji ber sotin û xer-

abkirinê yan fêqiyek mabe, wan di zivirînê de, ew digel xwe dianîn.  
Dê

belkî îro êvareka dereng hindêk peyda bibin.

— Tu bi Xudê kî, dapîrê bi mereq pirsyar ji kabaniya malê kir, ewan çî  
behsê gundî dikir? Tiştêk jê maye ava yan jî hemî kavi û wêran  
bûye?

— Te ya rast bivêt, kabaniya malê weha dest bi bersivê kir û lêvên  
xwe

miçandin û axînkeka kûr jî rahêla û dom da axiftina xwe. Dibêjin ber  
jî

li ser berî nemaye, xanî kavi in, rez û dar û bar, gişt sotine û bûne  
xwelî.

Dibêjin ji bilî çend dargûzeka ko hê li xwariya gundî şîn mane, weke  
din

gund hemû wêran e. Ma xwîşkê çawa wesa lê nehêt, nê eve çar  
cara, ew

da ber top û bombeyan û agir berdayê. Manê heke pîla jî be wekî  
xwe

namîne û dê hête helandin. Bes pa gund gundê we ye û li ber dilê  
we pir

şirîn e.

Bi van gotinên kabaniya malê navçavên dapîrê têk diçin û renekê  
xemokî bi xwe ve digire. Lewma dema kabanî çûye derê bona ko  
çayê ji

wan re bîne, dapîrê gote nevîka xwe:

— Besê! eger tu hez nekî bêye gundî, tu dişê li vê derê, li hêviya min  
bimînî heta ez vedigerim.

— Dapîr, eve çî ye tu dibêjî! Besnayê bi nerehetî gotê. Em pêkve hatine

û dê pêkve çin û dê pêkve jî zivirin.

Roj ava bû û şevê xwe bi ser deverê de dahêlabû. Ji nû de gund bi jîyan

ketibû. Bi şev karwançî, bazirgan û qeçaxçî ji bakûr, ji rexê dî yê tuxîban

dihatin. Jajî û penîr, kelleyên şekirê, pez û gelek tiştên din diaîin, Wan ew

li vî alî, bi çayê û pertal û dersok û tiştên din yê pêwîst diguhoîn.

Bazarê gilde bi gilde bû, her wekî gundiyan ew bi nav dikir, yan jî bazarê pêguhurkanê yan ser bi ser bû. Tiştê ko li ba te zêde bû, îhtiyaca te

pê nebû, te diguhart bi wî tiştê ko pêwîstiya te pê hebû, digel kesekê ko

pêwîstî bi metiryalê te, bi mitayê te hebû. Yan jî bo ko ew mita bête birin

13

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bo devereke ko bazarê wî lê hebû. Wî cihî em vedigerandin ve bo serdemê jinûvejîna abûriya tişt û mitayan, abûriya guhartinê.

Hejarî bû û pere jî di dest hemû kesan de nebû. Jîyan jî, diviya birêve biçûya û karê gilde bi gildeyê ji hemû karan bi rahavêjtir bû. Herçend bû,

kesine ko bazirganiyeka durust dikir, kirîn û firotina wan bi pereya bû,

hebûn û weke her dereka din ya dinyayê destê wan baş û xweş diçûn.

Zilamê wê mala dapîr û Besna lê mêvan hat û gote dapîrê:

— Ez dibêjim heke hûn lêvenebûne û her yên çûnê ne, nuke xweş delîve hilkeftiye. Tava heyvê ye û sê xurt ji gundê we, ko we baş nas dikin,

li ser rê ne. Min ew li binê gundî ragirtine û niha li benda we ne.

Evca

heke hûn hez dikin biçin, lezê bikin û vê re bigehin.

Weha bi şev û li ber tava heyvê, her pênc; sê xurt û dapîra Zuleyxa û

Besna, ketine rê ta gihaştine bin cehdeya qîrî. Li wê derê, wan xwe vegirt,

çunkî serbaz li hindav rê bûn û hema wan hest bi tiştê bikira ko li ser

cehdeyê yan li wan nêzîkan dilive, dê wan berê agirê çekên xwe bidayê.

Xurtê ji hemûyan bi xwe ve tir û mezintir ko navê wî Şêro bû, gote wan:

— Sehkinê, ez dê nuke derbas bim, heke we dît çî ne qewimî, paşî hûn

jî derbas bin. Li berahiyê xaleta Zuleyxa û yek ji we û paşî Besna û yê dî.

Lê hişyar bin, hema hûn gehiştin ser cehdeyê, êdî ranewestin û li pişt xwe

nezivirin û pêyên xwe sivik bikin.

Şêroyî xwe sivik havête ser cehdeyê û zû sê metrên şeqamê birîn û xwe

xiste nav tariya dar û baran li aliyê jorî. Li pey wî dapîr û Şahîn derbas

bûn.

Ji rexê jorî kuxkekê dijwar ji dapîrê hat. Digel hindê teqeyê jî dest pê

kir, lê ber bi aliyê Girga ve, gundê ko jê hatibûn.

Besnayê bi dengê bi tirsê werpêçayî gote Mîrzayî, xurtê ko pê re mayî:

— Heçku ew bi me hesiyan?

— Nexêr, Mîrzayî xwest wê hêmin bike da ko netirse. Gulle bi rexê gundî ve diçin. Serbaz bi şevê ditirsin, dar û bar li ber wan dibin reşe, evca

teqeyê li dewr û berên xwe dikin. Nuke xweş derfet e bo derbasbûnê, ka

destê xwe bide destê min û lezê bike.

Mîrzayî destê Besnayê girt û wan jî zû xwe gihande rexê din cem hevalan. Li aliyê din û hîn li evrazî sernekeftibûn dema ko şêlikên gul-

leyan bi ser wî rexê cehdeyê de, yê ko lê derbasbûne, barîn.

— Baş bû me cehde li pişt xwe hêlayî, dapîra Zuleyxa xwest fêmkirina

xwe bo rewşê bi vî awayî bîne ziman. Diyar e ji nû bi me hesiyan.

#### 14 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Nexêr, bawer nakim ewan bi me zanîbe, Şêroyî bi vî rengî jê re şirove kir. Lê ev karê wan e. Li demê ditirsin dest bi rex û rûyên çeperên

xwe dikin. Paşî dormandorên gundî gullebaran dikin. Piştî hîngê ce-

hdeyê û hemî rêyên nêzêkî xwe. Ji nîva şevê û wêvetir dibe gera topan, çel

û çiyayan û gundên rakirî top baran dikin.

Şahînê jî xwe ji babetî bê behir nekir û got:

— Tirsî mirinê ye, heke ma kê ageh ji wan heye. Eger rojekê pêşmerge

li van deran peyda bibin ve, hema du sê pêşmerge, bes in û têra wan dikin

ko wan hemû serbazan, sax bi destan bigirin.

— Ez dibêjim, Şêroyî xwest heval xwe ji bîr nekin lewma ev axiftine kir,

heke em bê deng biçin çêtir e, neku kesekî guh li dengê me bibe yan boseyek di rêya me de hebe. Divêt em hişyar bin û yekudu jî nehêlin.

Diviyabûya wan pêyên xwe sivik bikirana û zû biçûna, lê ji ber dapîrê û bona ko bi rê ve nemîne, wan jî çûna xwe girantir lê kir. Lê Mîrza, ko

di nav xurtên gundî de bi rastgotina xwe naskirî bû, nikarî ya di dilê xwe

de nebêje û ev axiftine arasteyî dapîrê kir:

— Xalet, nexeyide lê te rastî bivêt ne heq e yên li jiyê te bên rêyên hosa

zehmet û bi tirs û digel xurtên wekî me, ma ne we ye?

— Eh...pa tu yê tamsarî, axiftina wî dapîr tingijand. Ma heqî li ko derê

maye? Nê heqiyê li bin neheqiyê tir e tir e. Ma ji te ve heqê gundî bêtir li

ser kê ji me ye? Ê paşî ma çî heqê pîra li ser xurta nîne?

— Heqê gundî Li ser wan e yê xurtir û yê li serxwetir û bi hêz, weha

bê hizirkirin Mîrzayî bersiva dapîrê da.

— Nexêr, vê carê dapîr torebû, qet we nîne. Heqê gundî li ser me hemûya ne, lê pêtir li ser wa ne, yê ko jiyana xwe bêtir di gundî de der-

baskirine û bêtir ji xêr û bêrên wî xwarine.

Mîrza ma hêbetî, lê axiftina xwe jî ne vebirî û gêngaşeya xwe bi dapîrê

re domand:

— Ma çî bêjim, nêşxwe, tu ji me pitir li gundî jiyayî. Bes manê tu bi jiyê xwe jî ji me mezintirî.

Li vir û bi dengê ji yê berê nerimtir û pirî bawerî bi xwe dapîrê got:

— Ê...pa divêt min ji we bêtir dil bi gundî ve be û zûtir jê xerîb bibim.

Besnayê xwest dawiyê bi vê cirenîxê bîne, lew gote Mîrzayî:

— Kekê Mîrza! Ma xwe ne tu ji nû dapîra min dibînî? Kêşmekêş digel wê ji qesta ye. Kes neşê wê lêv bike û her dê bi ya xwe bike. Evca ya çêtir

ew e tu gelek li dû wê dirêj nekî û diyar e we ji bîr kir, ko Şêroyî ji me

xwestîye em gelek dengî ji xwe neînin.

15

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Xwe piştî wê gêngaşeyê dapîrê hebekê pêyên xwe siviktir lê kirin.

Ew ji

du seetan bêtir man bi rê ve heta ko nêzî gundê xwe Hirorê bûn. Ew

gundê ko dikeve ser tuxîban bi Kurdistana Bakûr re. Rê wekî xwe  
neman  
bûn, dar û bar bi serêk de hatibûn xwarê û gund mîna dehlekê  
lêhatibû.  
Besnayê ji çavên xwe bawer nekir ko eve gundê wa ye, yê ko ew  
berî du  
heyvan bi xurtî û bi topizê zorê jê hatine derêxistin û rakirin û malên  
wan  
û xwecihên gundî hatine tera bera kirin. Hukumetê her çendek ji  
wan  
havêtine derekê, dûrî warê bab û bapîran. Ew û dapîr bi maline din  
re fire  
dane nêzîkî Sêmêlê. Bê xanî, li bin xîveteka kevin û dirhayî, ne av,  
ne dar  
û bar û li bin tehirka tava şaryayî. Her çend rojan, carekê tankerekê  
leşk-  
erê Iraqê av ji wan re dianî. Li ber tankerî tenike dibûn rêz. Her jinek,  
ji  
tirsu neku av vê re negehe û bona ko xwe bighîjîne tankî, yê li  
pêşiya xwe  
radihavêtin û wisa dibû pevçûn û şer. Şer li ser avê li welatê avê.  
Serbazên  
ereb jî, yê ko bi tankî re, tamaşayî wê diramatê dikir û pê dikenîn.  
Çavên wan sîng û berên wan keç û jinan diçerandin û qet ne di xema  
bê  
avî û perîşaniya wan de bûn.  
Şêroyî gote dapîrê û Besnayê:  
— Ez dibêjim heke em bimînin pêkve çêtir e, lew heke hûn hez bikin



werin da em pêkve biçin nav bîstanên me û paşî biçin bo nav  
bîstanên we

yan berûvajî, ka hûn çawa hez dikin.

— Ne Şêroyê delal, dapîrê weha lê vegerand. Dê wesa li me  
hemûyan

bibe dereng û kesek ji me vê re nagehe têr li nav war û rez û latên  
xwe

bigerhe. Dê ez û Besê çin serekî li kavlê xanî û bîstanan bidin. Bes  
ka

bêjin me, ka bo zivirînê em û hûn kengî û li kû derê bigehin yek.

— Baş e, weko hûn dixwazin, her çende bi dilê Şêroyî nebû û wî  
lêvên

xwe miçandine serêk. Bes hêj zû û berî bibe spêde, divêt em li vê  
derê

bigihin hev da ko berî dinya rohin bibe, em cehdeyê derbas bikin.

Hişyarî xwe bin, neku topan li gundî bidin yan serbaz dakevin gundî.  
Û

her gaveka we hest bi teqelegekê kir yan we zanî ko biyanî di gundî  
de ne

çiya û çiya werin bo hindav vê rêyê. Em jî dê weha bikin da em  
hevrûşî çî

giriftaran nebin û bi silametî bizivirin.

— Gelek baş e, dapîrê jî ev pêşniyaza xwe avête ber wan, bes ez  
dibêjim

heke em li ser kanîka henê, ya li pişta rêyê û nepenî bigihin yek  
çêtir e,

çunkî cihekê li nik me naskirî ye û li cem biyaniyan nepenî û ne diyar  
e.

Ew li ser pêşniyara dapîrê pêkhatin. Xurt bo binê gundî, dapîr û Besna

jî bo nav gundî çûn. Dapîrê û nevîka wê diviya seh bikin gundî bi xwe ka

çi bi serî hatiye. Her çend bû şevê tariya xwe bi ser de dahêlabû, lê wan li

## 16 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ber ronahiya tava heyvê dît ko gund ne ew gundê cara bû, lê kaviil û xer-  
abe bû.

Bi wî dîmenê xemgîn yê gundî, cerg û hinav li wan kuzirîn. Neşiyar xwe li ber dîmenê gundê sotî û xaniyên herifandî û dar û barên şewitandî

bigirin, kizgiryokê hefkên wan girtin û êdî rê li ber girî ne dihate girtin.

Heta ew pira li nîva gundî jî nemabû. Lê xuya bû hinek camêran bi xêra

xwe du darspîndarên mezin li ser rûbarî, li şûna pirê, bo derbasbûnê li

berêk razandibûn.

— Ez dibêjim wexte em biçin bo nav latên xwe hêştta li me ne bûye dereng, Besnayê gote dapîra xwe.

Erdê wan pîçekê ji gundî veder bû. Bi 'tilê çiyayî ve, li hember Zinarê serkeş bû. Hindî diçûn û serdikeftin çi ji bilî kaviil û xerabe û sotî û rejûyê

ne dihate pêş çavên wan. Hindî xanî bû, ber jî li ser berî nema bû. Bîstan,

ji ber ko av jê hatibû qut kirin, hişk bûbûn. Xwe kaniyên avê li gundî,  
ji  
bo ko êdî avên wan ne zên û bin erd bibin, ji aliyê leşkerê Iraqê ve,  
bi çî-  
mentoyê hatibûn dagirtin. Ya ji dagîrkerî ve ew bi wî awayî dikare  
jiyanê  
li vî welatî bikuje û jinavbibe.  
Ava avdanê ji aliyê din yê çiyayî dihat bo ser çem û latên wan. Ew ji  
bin  
gupîtka Zinarî dizêya û şordibbû xwarê û hêj ew negehiştî binê  
çiyayî, li  
cihekî bilindtir ji çem û latên wan, wan hinek ji avê bi botikan, ko ji  
tîvilên spîndaran hatibûn duristkirin, derbasî rexê xwe dikir. Wan  
stûnên  
ji darmaziyê ko serên wan mîna du guha bûn di gelî de  
radiwestandin û  
binên wan baş di axê de diçikilandin. Wan paşî botik, ko ji solînkên  
mez-  
intir bûn, wekî cokê li ser komtên wan stûnan, di navbera du guhên  
wan  
de, dirazandin. Weha av di wan botikan de derbasî erdê wan dibû.  
Xwe  
kanîkên avê li ser erdê wan mişe bûn, lê ji ber ko ava wan kêmbû,  
ew bi  
kêrî avdanê nedihatîn.  
Xwe ew kultura gihandina avê ji cihekê avî bo cihekê bê av li wê  
deverê

gelek kevn bû. Ji bo nimûne mirov dikare qala kela Hirorê bike, ko navê gundê Hirorê jê hatiye. Ew keleheka pir kevnar e û di gelek jêderên dîrokî de qala wê hatiye kirin. Ev kele bê av e û dikeve rojhilata gundê Hirorê, li serê kumtekî li ser wê rêza çiyayî. Li binê çiyayî doleka avî heye dibêjinê

Tebala. Aveka boş û tezî ji çiyayê beramberî kelê, pîçek ji kelê bilindtir, dizêt û sernişîv dibe û Tebala pê avî dibe. Çaxê kel ava, mîrgeh û hukum- ranî tê de, av ji wê derê digehiştê kelê. Li wê dera av lê boş û bi hêz jê di- hate xwarê, kulozk weke boriyê dabûne berêk û av derbasî hundurê wan dibû. Li destpêkê û heta binê çiyayî kulozkên fereh bikaranîbûn, lê ji binê

17

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

çiyayî û ber bi kelê ve kulozk tengtir dibûn û wisa av bi hêz serdikefte silal û kelha Hirorê pê avî dibû.

Dapîr û Besna co û co çûn, bona ko bizanin ka ew çima av qutbûye û ber bi erdê wan ve nahêt.

— Xuya ye botîk, solînk xerab kirine lew av nahêt, dapîrê ev hizir kir.

— Neku li derekê cok wergerhabe yan jî berekê mezin vezelhabe nav û

rêya avê guhartibe, bi vî awayî Besnayê gumanên xwe diyar kirin.

Dehil û durî jî ko li herdu rexên coyê bûn, şewitandî bûn. Ew nêzîkî solînkên av derbaskirinê bûn, seh dikinê, li aliyê wan, berî solînkên bi

çend bihustekan, co xerabbûye. Xuya bû çend topek bi wê parçeya cokê

û rex û rûyên wê ketibûn, weha cok kûr kiribû û biribû xwarê, rihandibû.

Dapîra Zuleyxa baş hizra xwe di coyê de kir, paşî axînkeka kûr rahêla û

serê xwe hijand. Ji hindê bê hêvî bû ko ew û Besna bikaribin çareyekê lê

bikin û berê avê careka din bidin ve bo ser erdê xwe. Ew solînk li ciyê xwe

bûn û diyar bû ko hinek gundiyan ew solînkên nû danîbûn wê derê. Lê

ma bo çî bû, av ji solînkên derbas dibû bona ko li aliyê din, careka din şor

bibe ve xwarê bo nav rûbarê gundî. »Dibe ewên ev solînk deynayîn ne

gehiştin cokê çêbikin û dibe paşî bêne ve û cokê çêbikin.« dapîr bi xwe re

dipeyivî û ev bi dengekê nizim digote xwe. Lê Besnayê ageh ji dapîra xwe

û wan gotinên wê hebû.

— Keça min Besê! dapîrê gote nevîkê, hema her weçku diviyabûya em

jî weke giş gundiyan bihatana û me jî serek li gundê xwe bidaya. Eve me

wekir û me gundê xwe yê wêrankirî bi çavên serên xwe dît. Xudê heqê me

ji van bê bext û sitemkaran çê bike. Ya çêtir ew e em nuke biçin bo ser

gorê Xudê jê razî bab û dayika te û paşî û hê nebûye dereng em xwe bige-

hînin cem xurtan.

## 18 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—3—

Berî sal û nîva babê Besnayê pêşmerge bû. Ew piştî adara 1974-ê li berokên şerî bû, wî li dijî êrişa leşkerê Iraqê bo ser Kurdistanê şer dikir.

Wî weko her Kurdekê dilsoz û nîştîmanperwer berevanî ji axa welatê

xwe, ji milletê xwe dikir.

Tê bîra Besnayê, çaxê babê wê xwestî biçê pêşmergetiyê, tivenga wî

nebû. Evca rabû, taqê çêla heyî û hespê xwe û du pez firotin û ji xwe re bi

pereyên wan tivengek kirî. Heta şemilka xwe ya nivêjan jî, ko gelek ciwan

bû û yek bû ji berdilkên wî, da digel buhayê tivengê, çunkî dilê xudanê

tivengê ketibûyê.

Dema wî tiveng bi milê xwe ve kirî û bû pêşmerge, ew wisa bi kêf û dilxweş bû, heçku diçû dîlanekê. Axiftinên wî yên berî çûna wî bo berokên şerî li bîra Besnayê bûn, dema gotiyê:

— Keça min! me Kurdan gelek rezaletî û bindestî dîtiye. Nuke jî hemû

milet bi yek dil û yak can rabûye ser xwe. Gişan dest dane hev û sed der

sed serkeftin ya milletî ye. Wextê hindê hatiye ko vêca em jî azad û serfi-

raz û di aştiyê de weke milletên din yên cîhanê li ser axa welatê xwe bijîn.

Baş li bîra Besnayê bû ka dayika wê çend pitpit û qerqeşe li sera çêlê bi

serê wî de kir:

— Te çêl firot û te em bê şîr û mast hêlan. Ya karwanan jî, pa bê hesp

û dewar nayên kirin. Hey mala te ava, pa dê em çi xwin? Tu dê bi çi û

çawa biçî karwanan? Xwe bo me ji kulînê nahête xwarê!

Li dawiya dawiyê dayika wê ji rika xwe hate xwarê û gote babê wê:

— Bila çêl û hesp jî li ser hemûyan bin, hema bes vê carê ev şoreşe ser-

bikeve û me ji vê tepeserî û perîşaniyê azad bike. ko vêca em jî bi rehetî

serê xwe deynin ser balgihê xwe.

Pênc meh bi ser ve çûn û babê wê nehat ve mal. Saloxdan û deng û basên wî bi rêya rêbwar û rêving û pêşmergeyan digehiştine wan »Yê baş

e. Mêrxasên wekî wî di şeran de kêm in. Her tim li sîngê şerî ye...ûhd.«

Di wan çaxan de nexweşiyeka dijwar bi ser dayika Besnayê de zal bû.

Êşê ew lawaz kir û xiste nav nivînan. Gav bo gav êşa wê diwartir dibû û

19

#### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

rewşa wê pê têk diçû. Dukturê şoreşê, ko yê wê deverê bû, hat seredana

wê û derman kir. Lê got jî, ko ew nikare çî çareyan lê bike û ya çêtir ew e,

ew wê bi zûtirîn kat bibin cem duktorekê şehreza ko êşa wê fêm bike û

bikaribe wê êşê û dermanê wê destnîşan bike.

Besnayê çî bira nebûn. Babê wê hez dikir kurine wî hebin, lê piştî Besnayê, sê zarokên dayika wê çêbûn û her sê jî kiç bûn û ne diman, çend

heyvekan û dimirin û paşî êdî dayika wê zarok nebûn. Dapîra wê digot

»hêştta zarok ne kamil bûyî di zikî de dimirîn.« Ma çawa wesa nebe, nê ew

karê dayika wê dikir hema bi kuttek mêran dikir.



Xalê Besnayê, her çende bi dilî jî nebû, lê neçarbû ko biçe şûna babê wê  
bona ko ew bikaribe li tewara jinê bihêt. Pê dayika wê ji pehniyê ve dirizî  
û bêhna wê jî kurt dibû û carna jî bi yekcarî çik dibû û dihate halê mir-  
inê. Karê Besnayê jî sexbêrîjêkirina dayikê û malê bû. Lê dapîra wê jî,  
dayika babê wê, gelek arîkariya wê dikir. Xwe, bi hîç renekî, nekamiya  
gundiyan nedihat kirin û bi her terzekî ji dest wan dihat, wan teqsrî nedikir û destê arîkariyê dirêjî wan dikir. Xwe yarmetiya gundiyan piştî  
çûna babê wê bo pêşmergetiyê û eniya şerî bêtir lêhat. Lê dayika Besnayê  
di rewşeka pir xerab de bû û ji bilî duktorekê şehreza, kesekê dî nikaribû  
çareyekê jê re peyda bike.  
Dema babê Besê jina xwe di wê pergala gelek nexweş de dîtî, wî yekser  
biryar stand ko wê bibe baregehê mezinê pêşmergeyan, çunkî nexweş-  
aneyeka mezin û duktorine baş li wir in. Heke hat û wan jî çî çare lê nekir  
dê hewil bide wê bibe ba duktoran li Îranê.  
Wan, hekîm û mela nehêlan, ko ew nebiribe cem û ger gera duktora bû. Li bîra Besnayê bû carekê hekîmek anîn, hekîmî hinek giya zava  
û

giyayine din bi hev re kelandin û dane dayika wê. Paşî darê potî anî  
û agir

berdayê û li çend cihekan li ser pêyên dayika wê deynan. Dayika wê  
her

weko xwe û xerabtir jî lê hat û tiştê wî hekîmî lêzêdekirî şûnsotin  
bûn ko

li ser pêyên wê weke nîşanan man.

Bi şev, babê wê çû gundî, mehînek ji nik niyasekî anî. Alîk danî ber  
bona ko têr bixwe. Babê wê berê spêdeyê zû ji xew rabû û mehîn  
bire ser

avê û anî ve mal û alif dana ber. Wî kire inyet ko jina xwe bi mehînê  
heta

pira Balindeyî bibe û wêvetir bi otomobîlê bigehîne cem duktoran.  
Wê

şevê hemûyê xew bi çavên Besê neket. Ew jî siharê zû ji nav nivînan  
derkeft û rûnişte ber serê dayika xwe. Babê wê kurtan avête ser  
pişta

mehînê û bi ser û ber kir. Di wan delîveyan de Seîdê Gulê jî bi hespê  
xwe

yê karkirî ve hat. Biryar bû, ew jî bi bab û dayika wê re heta  
Balindeyî

20 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

biçe. Seîdê Gulê dostê babê wê yê herî nêzîk bû û bi deste bira  
dihatine

niyasîn. Piştî ko Seîdî hespê xwe bi dara li ber derê mala wan ve  
girêdayî,

babê wê alif danî ber hespê wî jî û paşî li keça xwe Besnayê ya ko wê gavê

di derê mezlekê de rawestayî zivirî û gotê:

— Besê! Eve em dê çin nivêja spêdeyê li mizgeftê bikin, tu jî arîkariya

dapîrê bike û dayika xwe bi ser û ber bike. Çend nanekan jî digel hindek

jajî û penîrî, ko têra me hersiyar bike, bêxe di nav serhevîrkekê de. Rast e Besnayê gelek hez ji dayika xwe dikir, lê piştî dayik nexwê ketî,

êdî wextê Besnayê nebû tê de çav bi Hogirî bikeve. Hogir salekê ji Besnayê mezintir bû. Xurtekê bejin dirêj, xudan dêmekê sor û sipî, yê ci-

wan û jêhatî û gelek xwîn şirîn bû.

Cara yekem ko wan tê de, ji nêzîk ve, baş yekudu naskirî û evîna wan

pêpkekî bilindtir bûyî, di rojeka havînê de bû. Hîngê Besna pazde salî bû

û ew wê rojê li ber bêrê bû. Hogir jî, li batî dayika xwe hatibû ber bêrê.

Ew demekê dirêj bû herduwan çavên xwe birbûne hev û dildarî digel he-

vudu bi çavan dikir.

Wê rojê di rêya vegeerê de bo gundî, wî û Besê yariya veşarkanê kir. Ewê,

xwe li pişt kevîrekê mezin veşart û Hogir li wê geriya. Demeka xweş pêve

çû, ew li pişt kevirî û Hogir xuya nebû. Besnayê xwest bizanibe ka çi  
bi  
serê Hogirî hatiye û ka hê li pey wê digere yan ji peydakirina wê  
bêhêvî  
bûye, evca ji cihê ko xwe tê de veşartî rabû. Di wî çaxê ko ew tê de  
li pişt  
xwe zivirî bona ko tişteki ji Hogirî bizanibe, hema hind dît navçavên  
wê  
û Hogirî pêrgî hevudu bûn. Hilma bêhna wî ya nêr ew ji binê pêya  
heta  
kulovanka serî rahejand. Hogirî xwe li benda wê û gotinan negirt û  
destên xwe dane milên wê. Dema laşê wî bi laşê wê ve nûsiya, wê  
hest bi  
xweşiyeka wisa kir, ko wê neya xwe di gewriya xwe de xendiqand û  
rê da  
maça wî ya nerm û xweş û hîn xwe berbide ser lêvên wê yên têhnî  
û dilê  
wê yê qeşavî. Tam bi dev û dil û can û laşê wan keft, lewma wan çi  
derfet  
ji dest xwe nedan.  
Di her delîveyekê ko bi dest wan ketibûya, tê de digehiştin yekudu  
û  
wan li dereka nepenî, bi dizîkî ve digel hevudu evîndarî dikirin. Lê  
Hogirî çi cara kuttekî lê nedikir. Rast e bêcgeyî maç û ramûsan  
dest  
dikirine hemû parçeyên laşên hevûdu, lê wan gupîtkî xweşiya  
evîndariyê  
ji şeva zavatî û bûkaniyê re hişt. Herduyan jivan da hevudu ko ew di

paşerojê de bibin jin û mêmên yekudu û bo heta hetayê bi hev re bin.

Ji ber wê çendê, ko wext bo xwe û Hogirê xwe hebe, wê gelek hez fikir

dayika wê zû ji êşa xwe rizgar bibe yan babê wê bihêt û wê bibe cem duk-

21

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

torekî û çareyek yan dermanek ji êşa wê re bihête dîtin û Besna jî wekî

caran bikeve nav himbêzên Hogirê xwe yê delal û xweştivî.

Lê êdî dereng bû bo wê daxwaza wê ko bête bicîanîn, çunkî berî vegera

babê wê ji berokê şerî, bi nêzîkî bîst rojekan, Hogirî jî gund hişt û çû.

Wî

guh neda dayika xwe ya bîjin û bexte bexta wê û kela pêşmergetiyê lê da,

evca gund û dayik û Besna hiştin û ew jî bû pêşmerge. Dema babê wê

hatiye ve mal û wî ji gundiyan re qala şerî û mêrxasiya pêşmergeyan kir û

her wesa jî çû ser behsê gundiyan xwe yê bi wî re li berokê şerî pêşmer-

getiyê dikin. Besnayê pir ji dil dixwest pirsiyara Hogirî jê bike lê bîsteh

nekir, baş bû dayika wî bi xwe hat û hêş ne rûniştî gote babê Besê:

— Tu bi Xudê kî ka bo min bêje ka Hogirê min çawa ye? Ka yê sax e

yan Xudê nekit tiştekan bi serî hatiye û kes nabêje min?  
— Hogir yê sax e û xurtekê pir jêhatî ye, babê Besê bersiva wê da.  
Dema Hogir hatî, ew li ser daxwaza xwe yekser bû pêşmerge û hate  
eniya  
şerî, cem me. Lê keko, min û çend camêrekan ew neçar kir ko  
vebigere  
bo rêzên paşiyê û nuke beşdarî kursekê dermanpêçiyê dibe.  
Besnayê karê dayika xwe kiribû û av li nanê tenik reşandibû. Di wê  
de-  
ma ko wê tê de dixwest nanî bi penîrî û jajî re bixe nav mêdekekê  
de, gir-  
rêna balefiran hat û bû gurme û gurm. Firokeyên mirinrêj kerb û  
kîna  
xwe ya faşîst di qumbeleyan de, bi ser gundî de barand. Wê carê  
mizgeft  
jî hingaft. Babê wê û melayê mizgeftê û Seîdê Gulê bi berkeftin.  
Hindî  
babê wê û mela bûn demildest hatin kuştin. Seîdê Gulê jî birîndar  
bû û  
pêyê wî yê rastê ji çokî ve hate firandin. Du jinên xwedî zarok û  
minalekê  
çwar salî jî di nîva gundî de hatin kuştin û çend kesek jî birîndarbûn.  
Dayika wê neşiya xwe li ber wê hemû derdeserî û êş û fîxan û  
perîşaniyê  
bigire. Şehîdbûna qurtalkerê wê, babê Besê, bi yekcarî deriyê  
hêviyan li  
ber wê girt. Girî û rondik û êşê bêhin lê malîq kir û di bin wî barê  
giran

de dil girtî bû û her di wê rojê de ji jiyânê mişext bû û da dû mêrî.  
Besna

ma bi tenê, bê bab û dayik û Hogir, di destên dapîra di navsalçûyî  
de.

## 22 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—4—

Xişxişek Hate guhên Besnayê. Seh kire rex û dorên xwe, lê çi nedît.  
Dengê dapîrê hatê digotê:

— Besê te xêr e tu hind li pişt xwe dizivirî?

— Ez dibêjim pêjnek hate guhên min, Besnayê weha dilnerehetiya  
xwe

ji dapîrê re xuya kir.

— Keça min, çi nîne, xwe netirsîne, dapîra guhgiran ho gote  
Besnayê

û destê wê girt û baş şidand û li dû xwe kişand. Dibe dehbeyek be  
yan jî

gundî bin...

Hê dapîrê axiftina xwe timam nekirî, ji hemû rexên wan ve bû qêr  
qêr

û gazî û lê heyitîn:

— Qîf..qîf, la teteherek. Bi erbiyeka hişk û pir dijwar »qîf la  
teteherek«

-rawestin ji cih nelivin- weko agirî dawêşyane ser wan. Herdu ji  
tirsan de,

di cihê xwe de bê liv man. Tirsa wan bêtir lê hat dema xudanên  
dengan

xuyabûn. Komandoyên leşkerê iraqî bûn, yê bi Quwat Xasse –  
Hêzên  
Taybetî – navkirî. Wan ew herdu dormandor kirin. Dapîrê Besnaka  
xwe  
hembêz kir û bi singê xwe ve şidand.  
Ji aliyê wan yê destê rastê ve valahiyek ma bû serbaz lê ne bûn.  
Çavê  
Besnayê bi wê valahiyê ket, destê dapîrê baş girt û berê xwe da wê  
derê.  
Xwestin xwe ji bazinê serbazan qurtal bikin û birevin. Serbaz  
hebekê dûrî  
wan bûn, herdu bezîn, lê pêyê dapîrê li berekî hilingift. Dapîr keft û  
destê  
wê ji destê Besnayê verest. Besna jî li dapîra xwe zivirî bo ko wê  
rabike ve  
ser pêyan, lê êdî dereng bû. Destên gemar û genî geştiyê wan.  
Serbaz li dor herduwan civiyan Dapîrê xwe bi Besnayê werkiribû,  
her  
weçku dixwest wê bi laşê xwe biparêze. Lê wan çavsor û hovan  
herdu ji  
hev dûr xistin. Sebazan gazî hevudu dikir: »ilzemû niswan el'usat,  
it-  
mete'u bîhum, şewifû elkurdiyat mal el erebî« – jinên pêşmergeyan  
bi-  
grin, dilê xwe pê hîn bikin, yê ereban nîşa wan jinên kurd bidin.  
Wan cilên wan di ber de dirandin û bexte bext û hewar û gaziyan  
wan  
di nav tîqe tîq û çivêlî û hariya laşên serbazên iraqî de winda bûn.



Xurtan, li jêriya gundî, li ber rûbarî gwîz diweşandin. Lê wê qerebalixê

23

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

û qîjiya jinan weha li wan kir ko gwîza bihêlin û li dû dangan ber bi cihê

qerebalixê biçin. Bêhnekê çûn û ji nişkan ve Mîrzayî destê xwe li herdu

hevalên xwe xist û tibra xwe dirêjî gêleşokekê kir. Hersê bi xwevedizîn

çûn hindav cihê rûdan û heşametê. Dibînin ji sed çekdarên leşkerê iraqî

bêtir li wê derê ne û li tiştêkî daçemyane û hin li ser in.

Hewar hewara Besnayê ya kiz pirs hemû ji xurtan re xuya kir. Ew mîna

teyrên kelexan, bi harbûn, li ser kelexên Besnayê û dapîrê bûn.

— Wey babo! Eve çi dikin?! Eve çi durunde û hov in! xurtê ji hemûyan

biçûktir Mîrzayî ev got û rast rabû ser xwe bo ko biçê telba wan. Lê Şêroyî

ew zû girt û kêşa ve bo ser erdê û destê xwe deyna ser devê wî bona ko çi

dangan ji xwe neîne û gotê:

— Ma tu dînbûyî, harbûyî. Ew ji sedan jî bêtir in û çek jî bi wan re ye

û em sê ne û bê çek in.

Lê hemcara Mîrza nikaribû xwe li ber wî dîmenê kirêt û pirî xem bigire  
û çî neke. Têdayê, pîçek veder ji gêleşoka serbazan, yekî ji wan tivenga  
xwe paldabû darekê û piştî kemera şelwarê xwe vekirî, ew sebaz ber bi  
herdu komên serbazan ve çû bona ko ew jî dehbeyê xwe rehet bike.  
Mîrzayî çavên xwe deynan ser tivenga wî serbazî û bê agahdarkirina her-  
du hevalên xwe, wî xwe ji wan vedizî û ber bi wê tivengê çû. Heta Şêro û  
Şahîn lê zivirîn, hîngê Mîrzayî dest dabû kilaşînkofê û bi hemû dengê  
xwe yê pirî xeyidîn li serbazan kire qêrî:  
— Hey bê şerefno! bê namusno.  
Wî digel hindê tiveng bire ser şêlikan û berê agirê wê da wan. Wî ji de-  
han bêtir jê, kuştî û birîndar, xistine erdî. Serbaz gelek bûn, hejmara wan  
ji gulleyên tivenga wî bêtir bûn. Serbazên mayîn sax bi agirê tivengên xwe  
li wî zivirîn û wan laşê wî bi şêlikên xwe kire serad. Wan bi wê jî bes nekir,  
ew hatin û wan bi sîkaran li kelexê wî xist û kelex hincinand.  
Şêroyî û Şahînî kerb û kîn û xeyidîn û girî di gewrî û hinavên xwe de bend kirin.  
Piştî kuştina Mîrzayî serbazan berê agirên tivengên xwe dan  
rex û dorên xwe û gulle bi ser her aliyekî ve çûn û barîn.  
Ne di ciyê xwe de bû ew li cihê xwe bimînin û bersîngê serbazan bi-

girin, çunkî wan dizanî ko ew bi wî awayî xwe didin kuştin. Lewre herdu bêgav man û wan xwe bo paşde kişand û serkeftine çiyayî û wan xwe di nav kevir û kumtên asê de veşart. Wan kire inyet ko li wê derê bin ta ko serbaz gundî berdidin û paşî ew werin cihê bûyerê û bizanibin ka çi bi serê Besnayê û dapîra Zuleyxa hatiye û laşê Mîrzayî jî li ciyekî biveşêrin.

#### 24 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—5—

Piştî ko bû spêde û tav hinekê bilindbû, Şêro û Şahîn ber bi cihê rûdanê çûn. Çaxê ew nêzîk bûn, wan ji wê derê, dengine, ko bi kurdî dipeyvîn, bihîstin. Wan ji dûrve mêze kirî, dît ko gundiyên wan in. Ew ber bi wan ve çûn û wan bi serpilkî silav kire wan û xwe li bersiva silavê negirt û yekser çûn ser kelexan. Hindî Mîrza bû hatibû pirt pirt kirin. Dapîr bê can û mirî bû û Besnaya cilik lê hatibûn çirçirandin. Wî xwe bi laşê xwe yê xwînelok û pirça xwe ya qijavij ve bi cendekê dapîrê werkiribû û li ser digiriya. — Eve hûn bûn digel wan? yekî ji zilaman axiftina xwe arasteyî Şêroyî

û Şahînî kir û destê xwe dirêjê Besnayê û kelexên dapîrê û Mîrzayî kir.

— Belê em bûn, Şêroyî ev bersiv digel axînkrahêlaneka kûr da.

— Ma hatina van dera seyran e! her wî zilamî ev gotine jî li navçavên Şêroyî û Şahînî da. Hey mala we ava, hûn çawa jina bi xwe re tînin cihên

hosa!

— Pismam nuke ne çaxê gilî û gazinda ne, piyawekê din axiftin li wî zil-

amî birî. Werin em lezê bikin darbesta bo cendeka durust bikin, hêj hukumetê dest bi topbarankirina gundî nekirî.

Wan zû dar bi dasa birîn û du darbest çêkirin, wan kelexên dapîrê û Mîrzayî razandine ser darbesta û hilgirtin. Besnayê xwest bi pêyan biçe lê

ne dikarî xwe baş li ser pêyan bigire. Ew ser evrazî çiyayî bûn û çî nemabû

ew berêveyî gundî bibin û topbarankirinê dest pê kir.

Wan pêlezkî kir bo ko nebîne armancên bertopan. Besna hew dikaribû

birêve biçe, Şahîn lê zivirî û xwest ber bi wê biçe bona ko destê wê bigire

û arîkariya wê bike bo ko wê ji agirê topan rizgar bike, lê berî ko bigehe

cem wê berkekê topê hat û li ber pêyên wî keft. Pirçikên berkê topê di laşê

wî de çûn û Şahîn di cih de keft erdî.

Şêro û zilamekê din lê zivirîn, hêştta can tê de bû, her yekî ji wan dest da

milekê wî û wan ew bi bez bi xwe re bir. Besnayê jî hêz da xwe û bi dû

wan keft. Ew berêveyî aliyê din yê çiyayî bûn û gehiştin cihekê ko çend

dewarek lêbûn, ew bi daran ve girêdayîbûn û diçeriyên. Ew dewar yê wê

25

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

desteka zilaman bû, yê bi Şêroyî û Besnayê û Şahînê re.

Ew li wê derê ji topbarankirinê hêmin bûn, ew rawestiyan û wan kelexê

Şahînê razand ser erdî û giş lê civiyan. Şêroyî hewil da pê re bipeyive lê

xuya bû gelek xwîn ji ber birînên wî çûbû û seçman ji serê wî jî girtibû,

ew ma bû laşekê bê can û ne liv.

— Evca em çi li van kelexan bikin? piyawekê ev pirs piştî çend de-qîqeyekên bêdengiyê kir.

Gêngaşeya wan li ser kelexan û ka çi lê bikin dest pê kir:

— Heke hûn dê bi ya min kin hema em dê wan li vê derê veşêrin, Şêroyî berî hemûyan ev pêşniyara xwe avête ber wan. Ya giring ew e ko ew

di axa welatê xwe de bihêne veşartin.

— Nexêr, birayê Şêro, wisa nîne, dengêkî bi vî awayî nerazîbûna xwe li

ser pêşniyara Şêroyî diyar kir. Pa belkî kes û kar û xizmên wan bixwazin

kelexên wan li goristanekê biveşêrin.

— Em nikarin di van kawdanan de, xwe, du sê rojan li benda kes û karên wan bigirin, zilamekê rihispî bi dengekê biryarder axift. Ma kî dizane ka dê ew kengî pê bizanin û ka eger pê bizanin dê wêrin bihên yan

na? Em baş dizanin ko gehiştina wan bo vê derê ne karekî weha hêsan e.

Evca hema ev e em kes û karên wan û hilon rabin da em li cihekî li vê derê

gora ji wan re çêbikin û wan tê de biveşêrin.

Baş bû ko wê revda zilaman tevir û mer jî pê re bûn. Ew ji karwanî vedi-

geryan û da çin bo nav Qeşûriyan. Piştî setimîna 1975-ê ew jî li wê derê

êwirîbûn, li hêviya ko azadiyek û aştiyek bikeve nav welatê wan û ew jî wê

çaxê bikaribin bi serfirazî vegezin Hirora xwe û welatê xwe.

Wê rojê, piştî ew ji karwanî vegeziyan û berî ko derbasî bakûrê

Kurdistanê bibin, wan xwest serekî li kevnegundê xwe bidin û bizanibin

ka di çî rewş û pergala de ye û ew bi ser wê karesatê hilbûn.

Wan di nav dar û baran de sê gor kolan û kelex weko şehîdan, bi cil û

berg ve tê de veşartin. Bi gotina hemûyan hersê canemerg in. Yê biyanî

hatiye ser axa wan û zordarî li wan kiriye û ew kuştine û weha ew dibin

şehîd, lewma, bi dîtina wan hemûyan, wan pêwîstî bi şûştinê nebû  
û du-  
rust bû wan bi cilên wan ve veşêrin. Wan mîna kêlan, berek li ber  
pê û  
berek li ber serê her gorekî deynan bona ko li ber çav bin. Paşî  
Şêroyî Çe-  
qoka xwe ya devxweş û sertûj anî derê û navên wan û roja  
şehîdbûna wan  
li ser kêliyên berserên goran hilkolandin.  
Ew piştî hîngê rûniştin, bona ko hinekê bêhna xwe bidin. Besna jî,  
her  
ji destpêka gihaştina wan bo wê derê û heta wê gavê jî weko  
mirovekê pir

## 26 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

sewdaser, bê hiş û bîr raketibû ser axê. Wî mîna kesekê gelek  
tirsiyayî  
destên xwe lêk şidandibûn û xwe mîna gulmiçkekê lê kiribû û wê  
carna  
bi dengê nizim digot na..na. Dîmenê wê, reng û sîmayê wê, ew  
hemû  
jan û êşandina wê dîtî diêxist ber çavan. Şêroyî car bo car tamaşayî  
wê  
dikir û ew bêqam li ber xwe diket û wî hest bi hindê dikir ko ew ji  
wê buy-  
erê berpirsiyar e. Yekî av û nan deynabûn ber Besnayê, lê wê devê  
xwe  
nekirê.

— Erê ma Zuleyxa û nevîka xwe li kî ve binecih bûbûn? zilamê rihispî pirsyar ji Şêroyî kir.

— Li devera Sêmêlê, Şêroyî got. Lê wan li ber bû vê dûmahiyê biçin Duhokê binecih bibin. Mala xalê Besnayê li wê derê ye û jiyan bo du jinên bê kes û bê xwedî û bê jêderekê jiyanê li wê deştê pir zehmet û di-

jwar e. Xalê wê jî, ji ber lomekirina xelkî, qayil bû ko wan bibe cem xwe.

— Ez dibêjim ya çêtir ew e her îşev hinek ji me wê derbasî aliyê dî yê

cehdeyê bikin, rehispiyî pêşniyaz kir. Tu , gotina xwe arasteyî Şêroyî kir,

ji ber ko her dê çiyê ve, heskê bila kesekî din jî bi te re bêt û wê bibin gundê Girka û ji wê derê tu wê bibe Duhokê yan jî bêje xalê wê bona ko

bête hewara wê.

— Erê xal, ma tu çi hizir dikî? Şêroyî bi hêbetbûn ev pirsyara xwe da pey pêşniyara pîrê rehdar, hema dê ho bi sanehî vegerim ve mal, bo nav

Duhokê û hukûmet hevrûşî min nabe?

Şêro weko piraniya xelkê Kurdistanê û bi taybetî xurtan ji jiyana di de-

verên bin destên hukûmeta Iraqê de têrbûbû û her xweziya wî fireka bayê

azadiyê bû. Ew sê caran, berî wê carê, hatibû gundî û vegeyabû ve û

hukumetê pê nizanîbû û weha, hîngê, ew bê problem li ser wî derbas-



bûbû. Lê wê karesatê, ew wê gavê danîbû ber biryardanê di pirsêka  
pir  
giring de, ji ber ko bi dîtina wî sefera wê carê weke carên pêşîn bi  
bêdengî  
derbas nedibû û ew ya qewimî nedihat veşartin û kes neşêt devê  
xelkî  
hemûyê bigire.  
Gelek caran, wextê Şêro pir tengav dibû, xweziya wî dibû ew ko li  
her  
derekê be bila bibe, bes ne li wî cihê be'isî û be'isîdost lê hebin. Wî  
di nav  
xwe de hest bi hindê fikir ko êdî ew hew dikare milkeçiyê bo  
be'isiyan  
bike û bi dîtina wî bê dengî û nexuyakirina nerazîbûnê li hember  
dagîrk-  
erî û siyaseta wî ya tepeserkirina kurdan û bêhurmetkirina mafên  
mirovan, bi xwe renekê milkeçiyê ye.

— Bê hêve û wê ve, hema ez gihaştîme zalgeha Bêgova yan bo nav  
ba-  
jarê Duhokê, wê gavê ez yê girtîm e, heçku nedixwest bi xwe re û bi  
wan

27

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

re gêngaşeyê li ser wê pirsê bike û biryara xwe dabû lewma Şêroyî  
bi wî  
rengî bersiva pîremêrî da. Ma hûn dizanin piştî şikestina şoreşa  
Îlonê çî li

xelkî hatiye? Çi ji tirsê û çi ji bo parastina berjewendiyên xwe yên taybetî

û çi pêxemetî pereyî xelkek heye xwe ji hukumetê re dike erd. Ev tişte

hemû ji bêhêvîbûnê û nedîtina çi paşerojeka xweş ya nêzîk peydabûne.

Belê, kesine hene xwe difiroşin û di rêya wan de difnên hukumetê û

dezgehên wê yên tepeserker li hemû deran belave ne. Evca, hema eve ez

jî, yek im weko we, digel we.

— Jiyana te ye û tu biryarê li ser didî, kalê rehispi got. Nuke divêt du

kes bi keçikê re biçin û wê bigehînin Girka. Wê bibin mala kesekî cihê

baweriyê be, ko wê bibe Duhokê mala xalê wê û ez dibêjim hecî Îbûyê

Mala Xidiran bi kêr hindê dihêt û dê xemê jê xwit.

Her ew kalê rehispi rabû û çû cem Besnayê û hêdî û bi zimanekê rehet

û nerim gotê:

— Keça min hosa nabe. Hilo rabe ser xwe, ya qewimî qewimiye û Xudê heqê te û me hemûyan ji wan bê bexta çêbike. Hilo here, li bin dar

biya henê kaniyeka avê heye, dest û çavên xwe bişû û xwe pîçekê bi ser û

ber bike. Nabe tu bi vî ser û berî biçî nav xelkî. Dê hilo û li ser xatira pîratiya min tepeka avê li çavên xwe bike.

Bê hizirkirin û weko laşekê ji mirinê rabûyî, wê xwe ber bi kanîkê bir.

Li wir axiftina zilaman dihate guhên wê:

— Baş e kî dikare û dixwaze bi keçikê re here Girka? pîremêrê ev pirsyar kir.

Berî ko Şêro xwe bo hindê destnîşan bike, du zilamên din xwe pêşkêş

kir û yekî ji wan got:

— Hema eve ez û pismamê min Mehemed dê digel wê çin. Me pêwîstî

bi kirîna hindek hûr û mûran jî heye, hema ev çûna Girka ji bo me xweşderfet e ko em li wê derê tiştan jî ji xwe re bikin.

Şêroyî jî xwe anî pêş ko pê re biçe, lê pîremêrê rîşdar bi hindê re bû ko

du kes bes in û weha bûne du kes, bê Şêroyî, ko pê re biçin.

— Gelek baş e, lê ya çêtir ew e gundî bi ya qewimî nezanin, pîrê rîşdar

got. Çunkî, paşî dê hukumet jî pê bizane û dê ew, li ser vê hemûya bi serê

wê hatî, wê bigirin û Xudê dizane dê çî bi serê wê înin. Evca, hûn ji kere-

ma xwe, wê rast bibin mala Îbûyê mala Xidiran, ew mirovekê mêrxas û

welatparêz e û devê wî jî bi sîvande ye, çî ji ber dernakeve. Bila ew li wê

derê cilkên wê biguhorin û bê dengjêanîn wê bibin Duhokê.

— Ez nizanim ka nuke xalê Besnayê çawa ye, lê hindî li bîra min e,  
ew

## 28 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

mirovekê pir serhişk û riko bûye, piştî çend deqîqeyên bêdengiyê  
her

eynî pîremêrî perdeya bêdengiyê dirand û ev axiftina xwe pêşberî  
Şêroyî

kir. Erê Şêro, ew hêşta wekî xwe ye, yan hatiye guhertin? Çunkî  
heke hîn

bi wê serreqiya xwe ma be, bi zehmet ew qebûl bike Besê biçê nav  
mala

wî û nemaze piştî evê, ya ko hatiye serê wê.

— Ma çi bibêjim, Şêroyî weha dest bi bersivdanê li ser pirsyara  
pîremêrî kir. Xalê wê, ka te çawa naskiriyê, hêşta weko xwe ye û  
pîçekê

xerabtir jî. Ê ez bawer nakim ew di rewş û karesata wê bigehe. Lê  
hêvî di

kurê wî yê mezin de ye ko ew bikaribe babê xwe qayil bike. Ew  
mamostayê xwendengehê ye û xurtekê baş e.

— De vêca were ji xema ne peqe, dijminê dagîrker destdirêjî û  
bêbextî

li keçikê kiriye û xalê wê xwe li ser wê tirş û tal bike, yekî ji herdu  
zilamên

ko dê bi Besnayê re biçin Girka ev got. Li şûna ko wê bihewîne û tola  
wê

bistîne, dê xem û janan lê zêde bike.

— Mixabin, lê belê hêj em di wî kirasê qemixî û peritî de ne, Şêroyî  
jî  
dîtina xwe weha diyar kir. Çend miletê me yê tepeser û perîşan e,  
deh cara  
hindîtir û bêtir jî jin ya tepeser û perîşan e. Hê em gelek li paş in,  
dijminî  
em dagîr û bindest kirine û em jî azadiyê di nav xwe de, bi xwe, li  
hevudu  
qedexe dikin. Hinek zordariyê li me dikin û em jî zordariyê li xwe bi  
xwe  
dikin. Em mêranî û qehremaniya xwe bi serê yekudu bikartînin.  
Besnayê ageh ji wê suhbeta wan hebû. Li rex kanîkê rûniştibû û  
destên  
xwe di avê de hiştibûn, xuya bû ji bîra wê çûbû ka bo çi destên wê  
di avê  
de ne. Ew ket deryaya hizr û malxulyanan û ew ji xwe re, di serê  
xwe de,  
li deriyekî hêviyê gerha. Lê giş rê li ber wê yaxîdibûn, dewr û ber li  
ber tarî  
dibû. Wê xwe didît bi tenê, pêxas û rûs, li biyabaneka mezin, ya bê  
dawî,  
ya pirî stirî û çîxin û dûpişk, li ber tehra havîneka pirî şewat.  
Ne dikarî xwe bi hindê qayil bike ko bila ji wan hov û dehbeyan aviz  
bibe û zakê wan di zikê wê de be. Weha hest dikir ko eger zarok  
bibe, ew  
dê berhemê wê zordarî û destdirêjkariyê be û pirsas ko berhemekê  
wisa ji  
zikê wê derbikeve jiyane ew pir têkda. Wê digote xwe:

»Nexêr..nexêr, naxwazim ew ji min bibe û bo heta hetayê nîşaneka sax

li ser wê fihêtiyê, li ber çavên min û çavên xelkê be. Ew dê her gav û her

roj wê tadariya li min hatiye kirin, li ber çavên min sax bike ve û dê bi wî

rengî her di wê êş û janê û tirsê de jîm«.

Nexêr, ew nikarî wê bixe serê xwe û neşiya xwe bi hindê qayil bike.

Cîhan li ber çavên wê şelha û hindî wê bir û anî, wê çî rêk nebirinê û çî

tîrêjkên omêdê bi dest wê nekeftin. Ew bi xwe re axift:

29

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

»Rast e dibe ko yekî baş û têgehiştî hebe, ko di min bigehe û ya hatiye

serê min fêhim bike û bibêje ew ne guneha Besê ye û dibe bixwaze destê

arîkariyê jî dirêjî min bike. Dibe piştevaniya min bike bona ko ez ji ket-

inê rabibim ve û xwe rabigirim û careka din bi jiyane re birêvebiçim.

Lê,

kesên wisa dê çend bin? Bila yek û du û bila sê bin û yên mayîn, behra

bêtir, dê ew bin yên ko dê tiblên xwe dirêj kine zikê min û paşî zarokê jê

dibe. Dê dest bi pispis û got gotka kin û ya xerabtir û bi kovantir li pey

wan pis pis û got gotkan dihêt. Eve, heke xalê min ez di cih de ne kuştim.

Belê, manê hêj ew namûşşûştinê weke berê têdigehe. Kî dê wî têbigehîne

ko kuştina min ne namûşşûştin e, ko namûs û şerefparastin ew e mirov

beşdar bibe di ramaliştin û paqijkirina welatê xwe de ji çepelên dest-

dirêjker û dagîrker.

Dê ji kî ve kurxal bikare wî belî bike û dîtina wî biguhore! Manê ez dizanim rastiya mala xalê min çawa ye; kurxalî çi desthilat li ser babê xwe

nîne û berûvajî wê, ew çi bê babê xwe nake. Tişteke ecêb û xerîb e, wex-

tê tengaviyê xal ne xal bû û her bi ser me ve nehat û ne got pa keça xwîş-

ka min bê kes û xwedî maye û hema ne hate seredana me jî piştî em li

Sêmêlê binecih bûbûn. Niha jî dê ez bim namûsa malê û divêt namûsa

xwe biparêze û her ji bo hindê divêt min ji rêya mala xwe rabimale da ko

kes qala mala wî bi xerabî neke.

Rast e Kurxalê min li cem xuyanî û biyaniyan bi peyvên ciwan û pêşketî

û teyisî dipeyive û bang dike. Behsê nûkirin û nûxwaziyê dike, lê li ber

babê xwe her kurê »Weye bab, tu çawa dixawazî bab...ûhd«yê ye.  
Bawer  
nakim kesek bikaribe xalê min têbigehîne ko destê dijminî ez  
birîndar  
kirime û xistime û divêt ew min rabigire û biparêze.«  
Dibe ko eger Hogir mabaya, dê wê xwe hinek bi wî û piştgiriya wî  
dilxweş bikiraya. Lê kê dizanî ka ew li kûderê ye. Besnayê hind dizanî  
ko  
ew demekî li Îranê bû û paşî çû Ewropayê û hind. Soz li cem Hogirî  
jî ne-  
ma, her çend e ew carna xwe bi hindê qayil dike ko dibe ew nizane  
ka ew  
li kûderê ye û nizane ka çawa danustandinê digel wê deyne û dibe  
jî Xudê  
neke tiştê ne baş bi serê wî hatibe.  
Malxulyanên bêzarker ew têkşilqand. Hindî wê hizra xwe di rewşa  
xwe  
de fikir, jiyana li ber çavên wê bêtir reş û tarî dibû û êdî tam û çêj bo  
jiyanê  
li nik wê nedima. Wê misteka avê li çavên xwe kir û vegerya ve bo  
cihê  
zilam lê rûniştî. Ew bê deng rûnişt û pala xwe da darekê.  
Tav avabû û şevê perdeya xwe ya reş bi ser wan de dahêla. Zilaman  
de-  
warên xwe bar kirin. Nêzîkî Besnayê, zilamekî barê hespê xwe ji ser  
kur-  
30 KURÊ ZINARÊ SERBILIND



tanî rakir û deyna erdî û paşî kurtan bilind kir û avête ser pişta dewarê

xwe. Di wan delîveyan de çavên Besnayê çûn çeqokekê, yek bihustî ji wê

wêvetir, ji tiştên wî zilamî, kete xwarê ser axê. Wê, bê hizirkirin û bê ko

bizanibe ka çima wedike, hêdî destê xwe dirêjî çeqokê kir û zû rakir û

xiste di berîka fîstanê xwe de.

Piştî wan xwe lêkdayî, giş ketine rê, ji bilî yekî bi tenê li wê derê ma bû,

dihat û diçû û temaşayî axê dikir. Hevalan gazî kirê bona ko lezê bike, wî

jî weha lê vegerand:

— Çeqoka min berzebûye û nabînim.

— Hey mala te ava, ma nuke çaxê li çeqokgerhanê ye, yekî ji hevalên

wî lê kire qêrî. Welatê me berze û winda dibe û hêj em pir ji dil û baş lê

na gerhin. Hema hişyar be ritil û gun jî li te berzenebin, heke paşî êdî jin

jî te naxwazin.

Bû tîq tîqa hineka û kenîn.

— De were mal tirnêsnek, ka çeqok çi ye, hema eve çeqoka min bo te,

yekî weha bangî wî kir.

Bûn du qol, du zilam bi Besnayê re ber bi gundê Girka çûn û Şêro bi

yên mayî re ber bi devera Qeşûriyan ketine rê. Yê ko çûn Girka du de-

war pê re bûn. Besna û zilamek siwar û zîlamê din bi pêyan li pêşiya wan

diçû. Berî ko ew serbikevine evraziyê ko ew dibirine bo hindav cehdeyê,

piyawê siyar gote pismamê xwe:

— Ez dibêjim heke em dewarên xwe li vê derê bihêlin û bi pêyan biçin

Girka û her îşev bizivrin ve û biçin bo malên xwe çêtir e, an tu çi dibêjî?

— Hey mala te ava diyar e dilê te bi gurgan dişewite, pismamî lê veg-

êra. Nê me inyet e tiştan bikirin, nexêr em dê dewara bi xwe re bibin. Lê

divêt em jê peyabibin û lixavên wan bigirin bo ko ne şehin û dengê wan

neçe serbazan.

Hosa xudanê pêşniyara duwê û Besna ji dewaran peyabûn. Ew bi hes-

pê xwe kete pêşiya Besnayê û yê din jî bi hespê xwe ve da dû wan.

— Hêdî hêdî werin, her yê li pêşiyê got, ez dê pîçek li pêştirî we bim, bo êmnaheyê.

Çil pêncih bihusteka çûn û dengê qêriyeka xendiqî ji Besnayê hat.

Zîlamê li berahîkê li pişt xwe zivirî, dît ko Besna sist û xav bû û ket ser axê.

Li hevalê xwe kire gazî û her du bi bez çûnê.

Besnayê kefîkek raheşandibû di devê xwe de bo ko qêjiya wê dûr neçe  
û çeqok bi hemû hêza xwe xistibû nav zikê xwe. Rengê navçavên her du zilaman wergerha û zer û pêtî bû û devên wan ji sersûrmanê mane beş.

31

### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Yekî kefîk ji devê wê anî derê û destên wê bi xurtî ji çeqokê vekirin û gote pismamê xwe:

— Xwîn mişe ji ber diçe, lê hêj ya sax e. Lê em çi li vê birînê bikin? Yê din li batî bersivê bide bi çavên xwe yên xemokî û dengekî şikestî gote Besnayê:

— Erê xwîşkê eve te çi anî serê xwe û serê me? Nê te em şehmizar kirin,

em dê êdî bi çi rû biçin bo nav xelkî, bo nav kes û kar û niyasên xwe?

— Hosa çêtir e, hê Besna ji ezmanî neketibû û ev bi dengekê pir kovandar got. Min ev kir bo ko xelik hemû bizanibin ko zordarî û dest-dirêjkarî li min hatiye kirin. Bila giş bizanin kîn e tadarî li min kirî.

Min

nevêt yê wan ji min bibe û naxwazim heta mirinê serşûr û devgirtî bimînin.

Rondik ji çavên wê hatine xwarê bo ser rûçikên wê û xwîn jî her ji ber

birîna wê ya kûr diçû. Herdu zilaman bizav kir ko çareyekê jê re bidozin.

Yekî dest dayê çeqok ji zikê wê kêşa derê û şaşika xwe ji serê xwe  
kir û  
birîn pê werpêça. Lê her zû cemedanî bi xwîna wê ter û sor bû.  
Herduyan  
çi şehrezahiyek di warê birînpêçiyê de nebû, hema hind karîn şaşika  
yê  
dîn jî li birînê bipêçin.  
Wan bi hêbetbûn hêv dikire Besnayê û di ber re bi çavên pirsyarkî  
tên  
dida hevûdu, her weçku her yekî ji yê din dipirsî ka çi bikin ko pê  
bikarib-  
in xwîna wê rabiwestînin. Lê diyar bû çi ji dest wan ne dihat û her  
weko  
kurd dibêjin »xwê dixwar û av bi ser de dikir«. Çi demekê wisa bi  
ser ve  
ne çû, bêhinhilkêşana Besnayê çik bû, êdî nedihat û nediçû. Besna  
di  
destên wan herdu pismaman de ma bê can û ne liv. Bi wî awayî wê  
xati-  
ra xwe ji cîhana xwe ya berteng, ji zîndana mezin xwest.

## 32 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—6—

Çaxê Şêroyî zanî ko Besnayê xwe kuştiye, cîhan bi yekcarî li ber  
çavên wî  
tarî bû. Ew di nav xwe de ariya, şariya û tingijî. Pîç pîçe kerb û kînê  
xwe

dahêla nav kûratiyên wî de. Kerb ji hukumeta Bexda û dam û dezgeh û leşkerê wê. Kerb ji desthilatdarên Iraqê û dûvelankên wan. Kerb ji dagîrkerên welatê wî, yên ko pêyan didin ser mafên mirovan û ser mirovî bi xwe, yên ko welatê wî ji xwecihên wî re kiriye zîndan. Kerb ji hemû simbolên tepeserkirin û daplosîn û zordariyê di nîştîmanê wî de û li her cihekî din li cîhanê. Di nav wî de diyalogeka navxweyî saz bû:

— Çima ew ho li me dikin, me tepeser dikin û zordariyê li me dikin? Di praktîkê de, ne me bi hevwehatiyên xwe dizanin û ne jî bi miletekê cuda. Ê nahêlin em azad û bi serê xwe jî bijîn. Erê gelo wan çi ji me divêt? Erê ew di wê bawerê de ne ko topizê zordariyê dikare vên û îrade û hest û nest û hezlêkirin û lênerînên mirovî biguhore yan jinav bibe û bimirîne? Aya ew wê hizrê dikin ko bi agir û asinê milletê Kurd di nav xwe de helînin? Eger hizirkirin û reftar û livîna wan bi vî awayî be, ew gelek û gelek şaş û çewt in û dê encamên siyasetên weha berûvajî bin. Ne milletê wan rehet dibe û ne milletê me. Rastî ew e; hindî mirov bêtir tê tengav kirin, bêtir diazire û pêla tingi-

jîn û xeyidînê li ba wî bilindtir û bi hêztir dibe. Rast e, dibe ko li pêşiyê

ew hemû şilqên û kekel neyê pêş çavan û bes di hundurê kesan de pey-

da dibe, lê roj bi roj, digel zêdebûn û dijwarbûna zordariyê, ew jî gerimtir

û bilindtir û bi hêztir dibin.

Di berdewambûna rewşa pir tengav û êşdar de, dê xeyidîn bigehe loka

peqînê û bêguman eger neyên çareserkirin, roja peqînê jî li dû tê.

Peqîn

jî vulkan e, sotin û şaryan pê re ye, ne çi hêz û ne çi kes nikarin devî li

vulkanê li ber peqînê bigirin, heta ko ew bi xwe ya di dil û hinavên xwe

de nehavêje û xwe baş rehet neke. Piraniya caran jî peqîn çav kore ne;

agirê wan ter û hişkan, baş û xeraban dide ber xwe.«

Li cem Şêroyî ev, ya ko li dijî milletê wî diqewimî tiştê ne li ber aqil bû û nedizanî ka desthilatdarên Bexdayê yên ko ew biryar didan çawa

33

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

hizir dîkin û çawa xwe û xelkê xwe yê ko şerên weha pê dîkin, qayil dîkin.

Diyaloga di nava wî de berdewam bû:

— Hey pa xişîm in, eve çendîn sal in, ew kurdan, xelkê Kurdistanê

bindest dikin, diêşînin, ditirsînin, digirin, azar didin, kit û mat û bi  
komelan dikujin, ji gundan derdixin û sergunî başûrê Iraqê dikin.  
Gundên wan, welatê wan kavi û wêran dikin û her rewş xerabtir e.  
Kurd  
her hene û axa xwe bernadin û li bin topizê zordariyê bêtir hevudu  
digirin  
û hişyariya neteweyî berfierhtir dibe û bêtir digehe û şerê man û  
nemanê  
û bergirîkirinê û berxwedan xwe didomîne û bi hêztir dibe.  
Bi vî terzî, ew kerb û kînê dixin di navbera me û ereban de û birînan  
kûrtir lê dikin. Bi vî şêweyî nahêlin akincîbûn li nik ereban jî hebe.  
Bi milyonên dolaran her salê di şerê xwe de li dijî milletê me pûç  
dikin,  
çekan pê dikirin, Kurdistanê pê dikin leşkergeh û qada şerî û paşî çî  
û  
dûmahîk çî ye û çawa ye? Hindî wêvetir e kurd şiyartir in û bêtir li  
xwe û  
doza xwe bi xwedî derdikevin.  
Dagîrker û xudanên van siyasetên ne mirovane jî li ser pelên sor û  
dax,  
li ser tirs û teqelegê, li ser mînan rûdinin û çî caran jî xweziya wan  
ya dij  
bi mirovî û mafê mirovî û mafên gelan bicînabe.  
Vê şirovekirinê bawerî bi xwe li nik wî bi hêztir lê kir, lê xem jî  
ketibûne  
ser hev û ew ji kulovanka serî heta binê piya vegirtibû. Giriya wî hat,  
ne  
xwest rê li ber bigire, giryeka bê deng, lê ya pirî firmêsk kir.

— Ma eva bi serê me hatî, bi serê kê ji bilî me hatiye? diyaloga wî ya navxweyî berdewambû. Bi serê cuhiyan li ser destê Hitlerî di şerê cîhanî yê duyem de? Ez di wê bawerê de me ko karesat û terajedyaya me ji ya hemûyan mezintir û bargirantir e. Ha nêzîk e temenê tepeserî û perîşanî û rezaletiya me ji sed salan derbas bibe û ev ji miletekî re pir e. Dême wî xemokî bû. Serê xwe xiste nav her du lepên xwe û weko ke- sekê serêşaneka mezin heyî, serê xwe givaşte serêk û pê re kete malxulyan û dalxelêdanê. Ew çend rojek bûn ew li wir bû, li zomeka Qeşûriyan. Kesine wek wî, bê gimlik, ji başûrê Kurdistanê, li wê derê hebûn. Rûniştivanên deverê, ew û yên weke wî, bi bertîlan, ji dest cendirmeyan qurtal dikirin û di- parastin. Kurdên bakûr arîkariyeka mezin pêşkêşî wan dikir. Şêro wê rojê hemûyê ji bin keprê ne derketibû derê, ew jî ji ber ko cendirme nêzîk bûn û digotin dûr nîne hêzeka leşkerê tirkan li nêzîkî zozanê xwecih bibe û hîngê rewş xerabtir dibe. Li cem wî ew jî zîndan bû, »ma heke mirov ji xwe û jiyana xwe êmin nebe û neşêt bi dilekê rehet

34 KURÊ ZINARÊ SERBILIND



rûne, rabe û binive, hema ji zîndanê jî xerabtir e«, wî weha digot xwe .

Hatin û çûna wî ne li gor dilê wî bû û diviyabûya ji zomê derneketibûya

û heke derketiba jî diviya bi qeçaxî û veşarkî ba û pêrgî cendirme û mît û

nehezan neba.

— Dê were welatê mirovî ji mirovî re bibe zîndan! Ev hevoke du sê caran digel xwe got.

Gelek hizra xwe di hindê de kir ka çi bike û dawiya wî dê çawa be.

Carna heza nivîsînê xwe li dilê wî dida û dixwest hewil bide xwe bi nivîsandinê ve mijûl bike, lê ji xwe dipirsî:

— »Çi binivîsim? Helbestan? Lê helbestvanên me ji mêşan jî bêtir in.

Xwe tişteke gelek baş e, lê dê çêtir be eger hindî wan çîroknivîs û roman-

nivîs û şanonivîs û nivîskarên rengên din yê edebî û ne edebî jî hebin.

Ez dibînim ya çêtir ew e ez xwe mijûlî nivîsandina çîrok û romanan bikim. Mebesta min bi vê gotinê ne kêmbuhakirina helbestê ye, nexêr,

çunkî dê her hezdarên nivîsandin û xwendina wê û her şêweyekê din yê

edebî hebin. Lê ez xwe bisteh dikim û dibêjim gelek hene helbestan dinivîsin bê ko nivîsa wan rengê helbestan tê de hebe û jê xuyadibe ko

mebesta wan bes ew e ko pirtûkeka wan hebe û weha û bi wan nivîsên

xwe torê kurdî dewlemend nakin. Bi ya min heke mirov nikare tişteke

baş yan tişteke nû binivîse bila xwe bi xwendina wî tiştî bêtir ji nivîsand-

ina wî mijûl bike.

Ez bêtir hez dikim dest bi nivîsandina çîrok û romanên bikim, çunkî nivîskar tê de serbestir e û dikare tê de qala gelek babet û bûyer û serhatî

û pirs û pirsgirêkan bike. Bi dîtina min çîrok û roman ji bilî ko ji gelek jiyana û ji babet zanistên cur bi cur û pêk tên, her wisa jî ji zimanî re û bo

hînbûna wî xwendîgeh in. Lê çî çîrok binivîsim û li ser çî?

Bêhneka xweş hizra xwe xiste ser hindê ka li ser çî babet û çî rûdanê binivîse, paşî dev ji wê hizirkirinê berda û gote xwe:

— »Ma çî ji babetên çîrok û romanên li Kurdistanê mişetir in? Hema li her bihustekî bi dehan tablo û wêneyên balkêş û serinckêş û sersor-

mêner hene lê şehrazahî û zanîna ew e mirov bikaribe wan destnîşan bike

û ruha wan nas bike.

Ma bo çî weke berahîk dest bi serhatiya jiyana xwe nekim? Belê, xweş

hizr e, li destpêkê dê bîrhatinên xwe nivîsim. Belê, wê ya ko bi serê min

hatî û min bi çavên xwe dîtî û nuke tê de dijîm binivîsim, dê tişteke baş û

bi sûd jê durust bibe. Bes pêwîst e ez endêşe û fantaziya xwe jî tê de bikar-

bînim û dê weha pirtûkeka rind û nirxdar û baş hête pêkanîn.

Oh...bi-

35

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

borin, bila biryara başî û nebaşıya pirtûkê bo xwendevan û rexnegiran

be.«

Hema hêšta kela hizra nivîsînê di ser û dil û mejiyê wî de, ew rabû ser

pêyan û defterka xwe ya biçûk û qelem ji berîka kirasê xwe derxistin.

Hinekê hat û çû û hewil da destpêkekê peyda bike. Paşî ji nişkan ve kete

ser zikê xwe, her weçku awayê xwedirêjkirina li ser zikê bêtir arîkariya wî

di nivîsandinê de dikir. Piştî kelevajî ser zikê xwe bûyî, afrandinê li nik wî

dest pê kir û çend rêzik nivîsandin. Rabû ser pêyan û rêzên nivîsandîn

xwendin, lê bi dilê wî nebûn. Torebû, ew per ji defterkê vekir û bi xeyidîn

qirmîçand û dûr havêt.

Kete ve ser zikê xwe û bizaveka din kir û qelemê xwe bi lez li ser kaxezê

xişand û ev çend rûpelên berahiyê ji romana xwe nivîsandin:

»Her gaveka ez hizra xwe di jiyana xwe de dikim yekser tişt û bûyer  
û  
bîrhatinên xembar û dilgir tîn bîra min. Erê gelo binasê vê çendê  
ew e ko  
jiyana min di piraniya xwe de ji nexweşî û talî û serborên jandar  
pêkhatiye, yan jî hema ew parçeyên êşdar yên jiyana min di min de  
zaltir  
in û her tim ew bi tenê li ber hizr û çavên min in?  
Çi cara ew rezaletî û perîşaniya ko em li bajarê Mûsilê tê de jiyayîn  
ji  
bîra min naçe. Her çend e ez li gundê Hirorê ji dayik bûme lê  
zaroktiya  
ko min li gundî borandî nahête bîra min, çimkî hê ez pênc salî bûm  
çaxê  
mala me ji Hirorê hatiye veguhastin. Hîngê, di sala 1961-ê de, babê  
min  
biryar da ko mala me ji gundî bibe wî bajêrî. Dixwest bi wî awayî  
xwe ji  
qerqeşe û şer û pevçûnên gundî û gundiyan li ser avê û axê û  
givandeyên  
milk û bîstanan dûr bixe. Wî ne dixwest dilê çî kesekî biêşîne.  
Hêviya wî ew bû bikaribe ew û zarokên xwe li Mûsilê ko bajarekê  
mezin e, nanê paletî û rencberiya xwe bê qerqeşe û bê serêşan  
bixwin.  
Babê min mirovekê gelek li ber xwe rawestayî bû. Her çende ji gundî  
mişext bû, lê kulmal û xweziya wî ya herî mezin ew bû ko bikaribe li  
gundê xwe, li ser axa xwe bi ked û renca xwe, tena û dilxweş û  
serfiraz bi-

jî. Lê, ba, ne li gor dilê gemîvanî bû û weko wî dixwest birêve neçû.  
Her

roj, şerenîx û lêkdan û mehkemeyên cîranan û gundiyan li ser vê zeviyê û

coka henê û bihustekî givandeyî bûn. Hema mamê min bi xwe jî li ser bi-

hustekê axê bi destê mala Reşoyê Sêbizinan hate kuştin. Herdu cîranên

hevudu bûn û ji kevin de şemate û kêşmekêşa wan li ser tuxîban bû.  
Bi

gotina Reşoyê Sêbizinan, mamê min bihustekê axa wî bi ser ya xwe ve

biribû.

Ne bes mamê min û babê min lê gizîrê gundî jî ko aqildar û rehispiyê

### 36 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

gundî bû, digot ko hindî li bîra wa ye, ew bihustê axê yê mamê min bû û

berî wî jî yê babê wî bû. Weha ye, ne çî tapo û ne çî mehkeme hene û her

yek û pehinka devê xwe û ka kî û çend şahid hene.

Reşoyê Sêbizinan bi yazde kurên xwe ve dixinzirî û dixwest bihustê axê

bike yê xwe û bo xudanê wê revda kuran bihustekê axê pir e. Mamê min

jî digot hema ne xweş e mirov neheqiyê li ser xwe qebûl bike û ew jî ji ya

xwe ne dihate xwarê. Li dawiya dawiyê Reşo bi kurên xwe ve çûn  
berahî-  
ka mamê min û rê li ber girt. Mamê min yê bi tenê bû û dema dîtî  
ko wan  
karê şerî kiriye xwest wan ji kerê belayê bîne xwarê, Lê bê hode bû.  
Ev,  
babê min, wisa ji min re vegêraye. Digot çî di destê mamê min de  
nema  
ji bilî ko berevaniyê ji xwe bike. Di şerî de, mamê min, wê rojê,  
Reşoyê  
Sêbizinan û sê kurên wî birîndar kirin. Lê her di wê rojê de û her di  
cihê  
şerî de mamê min hate kuştin. Reşo jî bi dijwarî, bi xencera mamê  
min  
hate birîndar kirin û bi wê birînê mir.  
Hîngê gelek ji gundiyan ketin bin babê min û wan ew han dida bona  
ko tola birayê xwe bistîne. Her çend e babê min mirovekê ne  
xwendewar  
bû lê yê pir aqilmend û li ser xwe û li dijî bikarnîna hêzê, di  
çareserkirina  
pirsgirêkan de bû, lewma jî guh neda wan û zoxandina wan û digote  
wan:  
— Ma tola çî û kê vekim? Nê Reşo jî hate kuştin û sê kurên wî jî  
birîn-  
dar bûne û birîna yekî ji wan pir dijwar e.  
Babê min ew bira bi tenê hebû û hindî dinyayekê hez jê dikir û qet  
goti-

na wî li erdî ne dida, lê wî jî pir babê min diviya û jê re gelek guhdar bû.

Nemana mamê min birîneka kûr di dilê babê min de çêkir. Çi roj ne der-

bas dibûn eger wî qala wî û mêrxasî û zîrekatiya wî ne kiriba.

Ne dihêla dayika min li malê girara danequtê çêbike, ji ber ko mamê min ew girar ne diviya û babê min jî ji ber wî, çêkirina wê girarê di malê

de qedexe kiribû. Ew qedexekirin piştî mirina mamê min jî ma û dayika

min ya ko pir hez ji wê girarê dikir, ne dikarî ji tirsê babê min wê çêbike,

her çende babê min bi xwe jî hez ji wê girarê dikir.

Ji bilî vê karesata ko babê min dilteng û xemgîn kirî, ew bi xwe jî ji arêşe

û problemên ava avdanê û cok û givande û sinûrên erdî bi cîranan re bê

behîr nebû. Wî ne diviya mîna mamê min, birayê xwe, bike. Xwe, wî bê

qam hez ji gundê xwe û axa xwe dikir. Evîndarê jiyana gundî û rezvantî

û cotkarî û şivantî û gavantiyê bû. Li cem wî ji jiyana bi azadî li ser erd û

milîk û axa xwe xweştir û serfiraztir nebû. Bes pa welê hat ko babê min, ji

bêgavîyê biryara veguhastina mala me bo Mûsilê bide.

Wênekirina dayika min bo gavên xatirxwestina babê min ji gundê xwe,

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bi xwe dramatek e, her roj li welatê me rû dide:

— Şev bû, tava heyvê geş dibû û diviyaba çî kesekî bi çûna me nezanî-

ba, dayika min gelek caran ev ji min re salox kiriye. Me çî ligel xwe ji

gundî ne bir. Hema em, bi can û laş û cilên xwe ve û nan û xwarineka têra

me û rêya me, bi dizîkî ve ji gundî derkeftin. Hê em ji gundî dûrnekeftibûn, babê te em rawestandî, li pişt xwe zivirî û berê xwe da

gundê dar û bar û tariyê di nav xwe de werpêçayî. Kizgiryokê hefka wî

girt û çav lê sor û pirî rondik bûn. Min qet bawer nedikir ko babê te dikare bigirî, çunkî min ew çî cara ne dîtibû bike girî, lê xuya bû cudabûn

ji gundî li nik wî ji hemû tiştêkê din diwartir û sextir bû. Kete ser çoka û

êdî pir ji dil kire girî. Giriya wî dil li min şewitand û ez jî berdame girî.

Paşî û her weko gund Mekkeha wî, herdu lepên xwe û navçavên xwe xis-

tine ser axê, te digot qey ew nivêjê ji gundî re dike. Paşî serê xwe bilind

kir, tijî lepên xwe ax kir û rabû ser pêyan û ew axa di lepên xwe de nêzîkî



dêmê xwe kir û devê xwe pêrana û maçîkire wê axa di lepan de. Ji  
nişkan  
ve ax ji destên xwe berda xwarê bo ser erdê û hat û ji ber barê kerê  
tu lê si-  
yar tûrkek anê derê, her weçku bo hindê anîbû. Ew tûrikê biçûk tijî  
ax kir  
û xiste ve ber barê kerî. Aha eve ew ax, hêşta di vî guldanê henê de  
ye, û  
dayika min tîla xwe dirêj dikire guldankekê gulroz tê de. Em kî ve  
biçin  
ew guldank bi me re ye. Her roj jî çend carekan bêhin dikeyê û her  
care-  
ka bêhin dikeyê pê re dipeyive û dibêjeyê: hey axa minê tu çenda  
buha gi-  
ran û şîrînî!  
Dicle bajêrê Mûsilê dike du alî; hindî yê çepê bû xwecihên wî piranî  
kurd bûn û hindî yê rastê bû piranî ereb bûn. Mala me li aliyê rastê  
bû.  
Em bi xwe maleka boş bûn. Manê her salekê duwa dayika min  
minalek  
dibû û bi wî rengî barê berpirsiya babê min mezintir û girantir dibû.  
Ew  
di wê bawerê de bû ko heke zarok bû Xudê rizqê wî jî digel wî dide.  
Lê li  
vî welatî jîyan pir sext û dijwar e û eger mirov kar neke çî hukumet  
û  
dezgeh xema ji bêkaran û rewşa wan naxwin.

Bêkarî jî mişe bû; di maleka heft heşt kesî de, yekî yan duwan kar dikir  
û yên din dixwar û bi aneh û hêviya Xudê jiyar birêve diçû û bêkarî  
û bê  
pereyî jî zêdetir dibû. Karbidestxistin ji paleyekê mîna babê min re  
pir  
qurs bû. Her roj siharê diçû meydankekê ji meydankên bajêr ko  
digot-  
inê elsaet û li wê derê bi dehan kesên din jî yên weko wî dicivyan,  
li  
hêviya ko kesekê pêwîstî bi paleyekê hebe bêt û ji xwe re paleyan bi  
dilê  
xwe hilbijêre, evca her kes û şansa xwe. Weha ne hêsan bû ko hemû  
ro-  
jan kar bi dest wî bikeve û gelek caran bi dilekê şikestî dihate ve  
mal, ji ber

### 38 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ko kar bi dest nediket û bêkariyê jî problem zêde dikirin.  
Kirêya xaniyan jî giran dibû û ya ji hemûyan jî nexweştir veguhastina  
malê bû. Hema, em da hind bînin rojekê ji rojan, ji nişkan ve û bê  
age-  
hdarkirineka pêşwext, xwediyê xanî hat û ji me xwest serê mehê  
xaniyê wî  
vala bikin. Mesele çi ye çi nîne? Welle, çivêlê xudanê xanî bê şerim  
dibê-  
je »xanî xaniyê min e û ez bi dilê xwe me« yan jî dibêje »kesek heye  
kirêye-

ka bêtir ji ya we dide, evca yan jê derbikevin yan jî dê kiriya we girantir lê

bikim«.

Hosa, her du sê heyvan diviyabaya babê min li xaniyekê din bigerhabaya û mal veguhastibaya. Bi wî awayî kirêdarî û veguhastina malê û

bêkariyê pişt li babê min xwîl kir û ew zû pîr kir û ji hêz xist. Diyar e ew

di nav xwe de pir diêşiya, lê derê cîhana xwe ya di nav xwe de, li ber çî ke-

sekî venedikir.

Di jiyê heft saliyê de, weke piraniya zarokên kurd, min jî dest bi karî kir; karekê pir erzan, di çayxaneyekê de. Zarokine ji hevjiyên min û du sê

salekan ji min mezintir boyaxçiya pêlavan li ser cadeyan dikir. Yên mez-

intir jî, ji genc û zilamên kurdan, di loqente û paletiya serxaniyan û barhilgiriya û di karên din yên zehmet de, li hember pereyekê kê, wekî

karkerên erzan, kar dikirin. Ji bona ko ez biçûbama xwendingehê diviyabaya min li her havînekê, li çaxê pişûdana havînê, karek ji xwe re biki-

raya, ko min pê pere, têra cilên xwe û xwendingehê û pirtûkên wê vêkx-

istibana, eger na, hîngê ez û xwendingeh ji hevudu xelas. Binasê vê yekê

jî mehaneya babê min ya kê, bû ko bi xurtî têra kirê û xwarinê dikir.

Hema hindî li bîra min e dayika min her eynî cilka li ber bûn. Du dest bûn, destek dişûşt û destek li ber bû. Xwe rewşa her heft birayên min jî

ne çêtir bû ji ya min.

Min her ji zaroktiya xwe pir hez ji xwendinê dikir û min mereq bû ez di paşerojê de bibim nivîskarekê bi nav û deng, ko pirtûkên wî mişe bêne

xwendin. Min li havînan li çayxaneyê mûsiliyekî kar dikir. Her ji berê spêdeyê heta êvareka dereng.

Ez gelek diwestiyam, lê min, li mal, xwe bi wê westiyane ne dianî derê,

ji ber ku, ya ji min ve, eger dayik û babê min pê bizanin ko karê min ji

min re sext û dijwar e, ew wenakin êdî ez kar bikim.

Dema li dawiya karî, piştî seet nehî şevê, xwediyê karî rojaneya min dixiste di nav destên min de, şadiyeka bê qam ez digirtim û min wê gavê

bêtir ji her gaveka dî, hest bi hebûna xwe dikir. Min ew rojane dixiste di

berîkeka penteronê xwe de û destê min jî di berîkê de ew fils digirtin, ji

39

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bo ko jê hêmin bim ko nakevin. Tiştekekê pir balkêş û pîroz e ew hest-pêkirin; ko mirovî buhayê ked û renca xwe wergirtiye û ew pere mafê

mirovî ye. Ne pereyê bi minet û xaxazokî û hêve û wêve ye, lê  
mirovî  
tişteki ji xwe daye ko renc û ked e û tişteki din li hember wê standiye  
ko  
pere ye. Gava ko ez di rê de pêrgî keçekê dibûm, min zirzir ji berîka  
xwe  
dianî û min bi hindê dixwest bala keçikê bikşînim ser hindê ko min  
jî  
pere hene û ez jî xudan kar im, kurt kurmanc, hestên zilamtiyê li  
cem  
min dibişkiftin.  
Dema diketime hundurê malê, yê serbilind û dilxweş bûm. Dayika  
min digot »wey ez gorî te bibim kurê min, karkerê malê«. Hîngê min  
hest  
bi hindê fikir ko ez jî tişteki im û min jî cihê xwe yê diyar di malê de  
heye.  
Pere diçûn destê dayika min û wê ew dixistine di sindoqeka ji  
tenikeyî  
ya mezin de, ko cilkên me tê de dihatin hilgirtin. Sindoq jî her qifilkirî  
bû  
û kilîl li cem dayika min bû. Berî destpêka sala xwendinê hinek ji  
wan  
pereyan ji bo kirîna cilikan diçûn û yên mayîn jî ji bo qelem û defter  
û  
pirtûk û rojaneya me, di çaxê çûna xwendingehê de, diman.  
Yek ji bîrhatinên êşdar ko her tim li ber çavên min e, ew bû ya bi  
serê  
me dihat, di riya çûna me de bo xwendingehê û vegera me ji wê.

Çaxê em zarokên kurdan derdikeftin derveyî malê û jê dûrdikeftin,  
co-

qeyên zarokên ereban bi keviran, û li havînê bi tîvilên şitiyan,  
radihêlan

me û bera me didan û şer digel me dikirin. Hêj heta nuke jî  
lêheytnên

wan di guhên min de deng vedidin. Rê li me digirtin û êrişî me dibûn  
û

ev slogan çend bare dikir:

— Kixdî kixdî hemaqe

şalil kubbî û lezeqe

lezeqe bil bixniyî

til'it kubbî mehşîyî

Yan slogana:

— Kixdî exû cehşo.

Ev, ji bilî xeber û gotinên pir ne xweş û keşefir û kirêt. Rast e ko ew  
zarok

bûn, lê em jî zarok bûn û me wilo, weko wan reftar nedikir. Erê gelo  
ma

ew kerba wan ji kûve dihat? Xwe me weke zarok, çi tiştê xerab rû  
bi rûyê

wan, li hember wan, li dijî wan ne kiribû. Me çi tişteke weha  
nekiribû ko

dilê wan pê biêşe û pê ji me bixeyidin.

40 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Xuya bû wan ew çende ji yên ji xwe mezintir girtibû; ji bab û dayik  
û

bera û xwîşk û kes û kar û niyasên xwe. Weha, rayeka giştî li cem ereban,

li beramberî kurdan, bi destên hukumdar û siyasetmedarên Iraqê û dezgehên wê yên ragehandinê hatibû çêkirin. Hema her bi vî awayî bingegehên tuximperistî û raşistî û faşistiyê tên deynan.

Hitler bi jînenîgara xwe ve wêneyekê herî li berçav e li ser vê rastiyê. Wî

ji kerbvebûnê ji Cuhiyên dest pê kir û paşî bû kerbvebûn ji her nifşê ne

arî heta ko gihaştiye kerbvebûnê ji her nifş û tiştê ne almanî û li dawiyê

kerb û kîn ji her kes û tiştê ne nazîst û ne hitlerî. Wî di nav zarok û xur-

tan de dest bi wê idiolojiya xwe kir, ji ber ko bi dîtina wî, ew pereke sipîn

e û xwîngerm in û ew dikare her tiştêkî bêxe serê wan.

Ev pêla raşistiyê di nav tirk û ereb û farisan jî de, li hember milletên biçûk, ko bi wan re dijîn heye. Bo nimûne, li Iraqê kerbvebûn ji cuhiyan

û ji kurdan û paşî kerbvebûn ji her nifş û kes û tiştêkê ne ereb weke rayeka

giştî cih girt. Sedam hat û ew bêtir zoxand û bû idiolojiyek, ko ereb çêtir

û paqijtir û pêşkeftîtirîn millet e û weha xwebizildîtin li cem wan peyd-

abû. Di ser demê Seddamî de ew kerbvebûn gehiştê loka kerbvebûnê ji

her kes û tiştêkê ne be'isî.

Biborin ko ez ji serhatiya xwe dûrketim, lê carna pir xweş e, eger mirov  
ya di dilê xwe de derbixe û bila bo ser kaxezekê jî be.  
Dema ko zarokê kurd li derve bi tenê baya, yan du zero bana, hîngê,  
da  
qolên zarokên ereban bi ser wan de bin Enter ibin Şedad û da dilê  
xwe bi  
me hîn kin. Lê eger zarokên kurdan ji duwan bêtir bana, hîngê yên  
ere-  
ban dibûn tirsinok û xwe didan aliyekî û digotin hevûdu: manê eve  
kurên hirçan in û hirç mirovan dixwin.  
Niha ez mezin im û ez baş dizanim ko ew zarok bûn û wan ne dizanî  
ka  
ew çi dikin û guneha wan çi nîne û mirov nikare wan gunehbar bike.  
Lê  
ya min pir diêşîne ew e ko bab û dayik û kes û karên wan zarokan  
ew  
didîtin dema êrişî me dibûn û tadarî li me dikir û ew ji cihên xwe ne  
dilivîn û em jêkvenedikirin. Wan xwe ji zarokên xwe tore nedikir, lê  
tamaşayî me dikir, her weçku dilên wan bi wan kiryarên zarokên  
wan hîn  
û xweş dibûn. Diyar bû ko wan şehnazî bi hindê dikir ko zarokên  
wan  
weha xwedî cerg in, »kurên ercinan« diqutin. Bêguman wan  
aferînek jî li  
ser wê kiryara xwe ji malbata xwe distand û wisa li ser kerb û kînê  
bere-



babek dihate perwerdekirin. Xwe ev, bi serê xwe, babetekê berfireh û

mezin e û ez vê ji sosyologan re dihêlim bona ko ew bi tefşiyên xwe yên

zanistî bikevine ser vê pirsê û şirove bikin û vekolînên xwe li ser bikin û

41

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

encaman jî bêxin ber çavên me bona ko em sûdê jê bibînin.

Bi dîtina min, her çend e di kulturên deverê de tiştine hevbeş hene, lê

kultura me û ereban, di bineretê xwe de, ji hev cuda ne û kultura me tay-

betmendiyan xwe hene û weha kesayetiya mirovê kurd jî cuda ye. Hindî

em zarokên kurdan bûn, em girêdayî sinc û torên bilind û baş yên nav-

malbatên xwe bûn. Ev, ne xwe bi zilzanîn e, lê rastiyeke e, divêt bête gotin.

Di malabata kurd de reftar, rabûn, rûniştin û danûstandin, ne wekî wê

bûne ya di nav malbata ereb de. Çi heddê me bû em şerê zarokekê ereban

yan çî zarokekî din bikin. Ne dibû peyveka pîs û çepel ji devê me der-

bikeftaya. Eger tiştêkê weha rûbidaya, da kî guhên me ji destên babên me

derbixistana. Babê min ne dixwest em çi kesekî biêşînin û digot: Her ke-  
sek weko xwe, ew pîs û em baş, ew tadariyê dikin û em xwe diparêzin û  
destdirêjkariya nakin.  
Xwe, bêguman ev reftareka baş e lê li cihekê ko yasa hemû tişt be  
û mafê  
çi kesekî di bin sîbera yasayê de winda nebe, qanûn û hukumet mafên  
mirovî bê cudahî biparêze. Lê çaxê qanûn nebe yan li astê hindê  
nebe ko  
mirovî û avru û mafê wî weke mirov biparêze, hîngê, divêt mirov serî li  
hember her renekê zordarî û perçiqandinê be, çi be û çawa be bila bibe,  
ne çemîne, heke dê mirov bite axa bin piyên tadakaran.  
Bi dîtina min eger qanûn nebe yan bes bi nivîskî hebe û weke din kesên  
desthilatdar li gor dilên xwe dikin, wê çaxê pêwîst e mirov li gor zanîn û  
şiyar û pêçêbûnên xwe û li gor kawdan û dewr û berê xwe, rê li ber wê  
zordariyê bigire û hewil bide wê nehêle. Evca ew bizav û hewildan dê  
çawa be, dê organîzekirî yan hema take kesî be, ev pirseka girêdayî wî  
rengê zordariyê û qada berfirehbûna wê ye.

Di salên şêstan de hukumeta Iraqê berdewam bû li ser şerê xwe li dijî

kurdan û xwestina wan bo mafên xwe yê neteweyî li ser xaka xwe. Hewildana wê ya ji hemûyan mezintir ew bû ko kurd şerê kurdî bike; li

gor siyaseta »ji hev veqetîne û xwe bi ser de zal bike«. Û wisa jî bû, hukumetê, ji bilî leşkerê xwe, eşîrine kurd, di şerê xwe de li dijî kurdan

bikardianîn. Her digel hindê jî propagandeya xwe dikir û digot: Ha, mêzebikinê, kurd nikarin yek bigirin, kurd dijminê serê xwe ne, kurd nikarin çi dewleta birêvebibin, kurd dê her dijminê yek û du bin, em dikarin wan birêvebibin ûhd.

Hîngê hukumetê hêzên »firsan« çete yan, bi kurdiya durust caş, ji hin-

dek eşîrên kurdan çêkirin. Hukumetê pere û mezinatî dida axa û serokeşîr û şêxan bona ko ew eşîrên xwe, kesên dewr û berên xwe

#### 42 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bixapînin û çekî bi milên wan vekin û bikin çete û bibin şerî lidijî pêşmergeyan. Rast e ew kulav çû serê piraniya axayan lê ne çû serê pi-

raniya kurdan. Babê min jî yek bû ji wê piraniya ko xwe û zarokên xwe ji

wê caşatiyê parastî.

Axayê devera me ko li taxa Zuhûrê li Mûsilê, di qesra xwe ya xweş û

mezin de dijiya, gelek caran hinarte pey babê min û xwest wî, bi pereyan

yan bi tirsandinê qayil bike ko ew yan kêmtişt kurekê wî bibe caş, lê babê

min bi ya axayî nekir û her digot: »Eger ez ji birsa jî bimirim ez qebûl nakim kes ji mala min bibe caş. Bila kurên min bibin serbaz di leşkerê

Iraqê de, sed hezar caran bi namûstir e ji hindê ko bibin çete û dûvelank«.

Çetatî û şerê birayê xwe yê kurd li kin wî pîstirîn kar bû û xinizkariyeka

ji hemûyan mezintir bû û her digot: ew kanîka te av jê vexwar bera ne

avêjeyê.

Babê min her ji destpêka hatina xwe bo bajêrê Mûsilê û her ji wê gava

gundê xwe hêlayî, umêda veqerê bo gundî û bo ser axa xwe pê re bû û di-

gel dijiya. Wî baweriyeka mezin bi hindê hebû ko dê her rojek hêt ko ew

û gundê xwe, tê de bigehin ve hevudu û ew roj hat.

Piştî ko partiya Be'is hatiye ser hukmî li Iraqê û nikarî bi hêza çekî ser-

hildana başûrê Kurdistanê ji nav bibe, neçarbû di sala 1970-ê de gotin-

bêjiyan bi serokatiya kurdan re, li ser çareserkirina pirsgerêka kurd bike.

Li dawiyê, li ser şêweyê otonimî ji kurdan re, li ser axa Kurdistanê Iraqê

pêkhatin û di adara her eynî salê de beyannameya lihevhatinê, ya naskirî

bi beyannameya (Yazdeyî Adarê) ji hêla kurdan û hukumeta Iraqê ve hate

ragehandin. Wilo şer rawestiya û aştiyeka berwext peydabû û rê li ber

xelkî vebû ko vebigerin bo ser gund û milk û warên xwe.

Bi wî rengî delîve li ber bicîhatina niyaza babê min jî vebû. Wî, di hezîrana her wê salê de, mala me veguhazte Hirora xwe ya delal.

Lê mixabin ko jiyê aştiyê weko carên pêşîn kin bû. Piştî ko hukumeta be'isiyan cihê pêyên xwe xweşkirî û desthilata xwe di Iraqê de mukum

kirî û bi hêzistî û piştî bi hêzistina peywendiyên xwe bi dewletên kenkene yên cîhana me re, wê yekser zimanê xwe digel kurdan guhart ve.

Wê, bi yek alî otonomiyê xwe yê kartonî ragehand û xwefiroş û patex-

orine kurd û bê wergirtina raya kurdan bi xwe, kirine nûnerên kurdan û

bê xiş, gunên wan di destên be'isiyan de bûn. Wê, her di eynî wextî de,

êrişa xwe ya çekdar jî anî bo ser Kurdistanê.

Piştî nêzîkî saleka şerî û piştî ko zîyanên mezin li ser destê serhildana

kurd ya çekdar bi leşkerê Iraqê ketîn û ew nikaribû wê rabûneserxweyê ji

43

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

nav bibe û seranserê Kurdistanê dagîr bike ve, hukumeta Be'is arîkarî ji şahî xwest. Hosa, herdu dijminên yekûdu û ji bo lêdana kurdan û parastina berjewendiyên xwe yên hevpişk, dest dane hevûdu. Weha, bi pîrozkirina dewletên mezin, wan di adara 1975-ê de gurzê xwe yê bê wu-jdan daweşande serhildana Kurdistanê û careka din başûrê welatî kete ve bin destê be'isîyên Iraqê. Evca desthilatdarên Iraqê her tiştekê ji dest hatî li dijî gelê Kurdistanê kir û karesat li pey karesatê bi serê kurdan û kêmatiyên din yên neteweyî li Kurdistanê anîn. Xelik girtin, kuştin û berze kirin. Hinek jî derbiderî başûrê Iraqê kirin, bo nav deşt û leylanên şewitî û germixî û hin jî di or-dîgehên zoremilî de, bi topizê zoriyê binecih kirin. Başûrê welatî bi dirê-jahiya tuxîbên xwe li bakûr û rojava û rojhilat û bi kûratiya bîst kîlome-tran ji rûniştivanan hate valakirin. Gund, xanî, war û milk û dar û bar û rez û derametên wan hatin sotin û bi erdî ve rast kirin. Li hinek deveran jî, li şûna kurdan ereb binecih kirin û ji wan re xanî ava kirin û ax li ser wan dabeş kir û pere û otomobîl danê.

Biborin, ko ez we jî bi xwe re dibim bo nav politîkê, lê çare tune ye,  
ez  
neçar im qala van pirsan bikim, ji ber ko ev girêdayî min û malbat û  
kes  
û kar û derdora min in, xwe ez jî yê çîroka xwe û ka çi hatiye serê  
min ji  
were dibêjim. Gundê me, Hirorê jî yek bû ji wan gundên li berahîkê  
ha-  
tine vala û wêran û kivil kirin.  
Leşkerê Iraqê em û tişt û miştên me heyîn, bi zîlên xwe birin û  
havêtine  
ser cehdeyekê li bajarê Duhokê. Çi kes û nasên me di bajêrî de  
nebûn.  
Baş bû hîngê havîn bû û xwendingeh girtî bûn. Bajêr jî yê kurdan bû  
û  
xwecihên bajêrî pir dil bi me şewitî û xwestin arîkariya me bikin. Her  
çend malek dakirine di xwendingehê de, bi mercekî, berî ko  
xwendingeh vebin û sala xwendinê dest pê bike em xaniyan ji xwe  
re kirê  
bikin û xwendingehan vala bikin.  
Babê min derbiderbûna wê carê ne dît, ji ber ko wî pêş barkirina me  
ji  
gundî bi du mehan xatra xwe ji jiyane xwest û mir. Em weha, di  
bajêrê  
Duhokê de binecih bûn.  
Ez careka din vedigerim ve bo ser pirsê kerbê ya ko di nav min de  
serî

hildide. Erê gelo ew ya nû ye, yan jî girêdayî wê hemûyê ye, ya ji zarok-  
tiyê heta niha bi serê min hatî û min bi çavên xwe dîtî? Bêguman bi wê  
gişê ve girêdayî ye û niha dest bi xuyabûn û bizivînê dike. Lê, aya ev kerbe  
li dijî wan kes û sembolan e yê ko me tepeser û perîşan dikin? Yan jî kerb  
e ji destdirêjkariyên wan bo ser ax û gund û bajar û mirov û kultura me?

#### 44 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Yan kerbe li hember reftar û kiryar û bîr û bawer û dîtinên wan yê regezperês,  
ko xwe bi nijadekê bilind û resen didin nasîn û me, bi pir niz-  
im û çi ne li qelem didin?  
Dibe ko kerb be li dijî wê çendê ko ew xwe bi tenê bi mirov dibînin  
û  
mafê her tiştêkî didin xwe û yê derveyî nifşê wan, li gora wan ne mirov  
in û nabe daxwaza çi mafan bikin û eger bixwazin weko mirovan bijîn,  
divêt xwe ji nijadê xwe bişûn û xwe bi nifşê wan ve girê bidin. Dibe jî ko  
ev kerb li hember wan hemû tiştan e ko bi zordariyê aviz in û zordarî jê  
çêdibin.



Xwe rast e ko ev kerbe piştî kuştina herdu hevalên min û xaleta Zuleyxa  
û xwekuştina Besnayê peqiya. Lê weha ye, ko tişt kete serêk û bargiran û  
dijwar bû dê reaksiyon, rengdanewe, çêbibe. Dibe jî ko serekaniya vê ker-  
bê ne bes ev bin, lê tiştine rojane jî bin.  
Bila ez we bo paşde bizivînim; demê hê ez dwazde sêzde salî û dildarê  
xwendinê. Hîngê, kes nebû nîşa me bide ka bo zarokekî, di jiyê me de çi  
baştir e bixwîne. Evca ez û hinê û mereqa xwe. Wey gidiyo ezo, her çi  
pirtûka dikefte ber destên min, mîna kulafiyên dikeftime ber û min dixwend.  
Bigire ji pirtûk û çîrokên ayînî û hezar şev û şevê û dastan û ef-  
saneyên millî û pirtûkên dîrokê û çîrokên zarokan heta digehiştê çîrokên  
polîsî yên weko Ersîn Lobîn ûhd. Ne bes vava, lê çîrok û romanên kenkeneyên  
edebî cîhanî, mîna Dostoyevskî, Tolstoyî, Viktor Hogoyî,  
Balzakî, Dîkenzî, Çîxofî, Sarterî, Kamoyî, Hemingwayî û hêş gelekên din jî.  
Ez dibêjim ji ber wê xwendina min ya mişe kela nivîsînê li min da.  
Hîngê min xwe bêtir di nivîsandina helbest û kurte çîrokan de desthil  
didît, lê bo zanîna we min bi zimanê erebî dinivîsand.

Min car û baran hinek ji wan nivîsên xwe nîşa mamosteyê xwe yê  
zi-  
man û edebê erebî didan. Li destpêkê bawer ji min nekir ko ez im  
nivîskarê wan berheman, lê di dawiyê de bawer ji wê rastiye kir û  
ez han  
didam bo berdewambûnê li ser helbestraçandinê. Bes pîç pîçe dilê  
min ji  
nivîsandina bi erebî sar bû û jê dûrkeftim û gehiştê hindê ko min bi  
yek-  
carî dev jê berda û min hevsarê xwe ji nû bi dest xwe girt. Belê, min  
berê  
xwe da zimanê xwe û nivîsandinê bi kurdî.  
Dibe reftara ereban ya negatîv û gelek hezkirina min ji kurdiyê, bûn  
hoyên ko erebî li ber dilê min reş bibe. Ê wisa mereqa min kete ser  
zi-  
manê min yê kurdî û kultura me.  
Tê bîra min ew cara dawiyê ya ko min tê de helbesteka xwe ji  
kovareka

45

#### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

erebî re şandî. Hertim heval û hogirên min ez pal didam bona ko ez  
berhemên xwe di rojname û kovarên erebî de belav bikim. Min li  
dest-  
pêkê guh nedida wan, ji ber ko helbesta min her çend e bi zimanê  
erebî  
bû lê wêneyên wê ji Kurdistanê û ji nav milletê min bûn û min dizanî  
ew

tiştê weha naweşînin û eger ew biweşînin jî dê ji wê ruhê vala bikin.  
Lê  
wan dostan bawer nedikir û min jî ew çend carekan hinartin û ne  
hatine  
weşandin. Helbesta dawiyê, min ji kovareke erebî re birêkir. Mirov  
bo  
rastiyê bibêje wan helbest belav kir, lê peyva kurd jê anîne derê û li  
batî  
wê peyva ereb cih girtibû. Bi wî terzî şî'ir jî hate dagîr kirin.  
Bêguman ez gelek têkçûm, ji berku peyva kurd ya di helbestê de pê-  
nasnameya wê helbesta min bû, çaxê wan kurd jê havêtî û ereb  
xistiye ci-  
hê wê, êdî ne ji dûr û ne ji nêzîk jan û ah û vîxanên xurtê kurd ji  
helbestê  
ne dihatin. Ya ji hemûyan jî êşdartir ew bû ko navê min bi wê  
helbestê re  
hatibû weşandin. Lê belê baş bû çî kesekî ji dost û hevalan qala wê  
nekir.  
Xuya bû wan ew nexwendibû. Min jî xwe bi ser hindê ve nebir ko  
ew  
helbest hatiye weşandin. Her çende min pir hez dikir ko qala wê  
tadariyê  
bikim û redaksyona kovarê rû reş bikim, lê ma kî dê ji min bawer  
bike,  
da weko tifa ser evraz be û her da bi nav çavên min bi xwe bikeve  
ve.  
Min, piştî hîngê bi demekê kurt, dev ji nivêjan jî berda û ez ji dînî  
dûr-

ketim. Lê bawerî bi Xwedê, bi hebûna hêza qenc û baş li hember  
zulmê  
û xerabkaran li vê cîhanê, di hundurê min de ma cihgirtî. Dibe jî ew  
dûr-  
ketina min ji misilmantiyê vedigere ser hindê ko bi dîtina min ya  
hîngê,  
misilmantî û erebtî dibûn du rûyên yek pereyî, du êdyemên bi  
hevudu ve  
girêdayî, ji asinekî û timamkerên hevudu ne. Ê di encamê de, di  
xizmeta  
ereban û bi hêzistina wan bi tenê de ne.  
Her çende min ew jî baş dizanî ko misilmanên rastîn jî hene ko ji dil  
misilmantiya xwe ya girêdayî Xudê birêve dibin; mirovine temaşayî  
mis-  
ilmantiyê dikin weko rê ji bona xwenêzîkkirinê ji Xudê û bi wî awayî  
Xwedê diperêsin. Ev tiştêkê pir rewa ye û mirovên ji wî rengî di nav  
hemû  
ayînan de; mîna fele û cuhî ûhd..hene û ew cihê rêzdariyê ne. Ji  
berku ar-  
manca wan ne polotîke û tevlihevkirina dînî bi siyasetê ye, lê  
mebesta  
wan, li gor baweriya wan, xwe parastin e ji xerabî û çewtiyan bi rêya  
bêtir  
xwenêzîkkirinê ji Xwedê. Kesên weha ko hurmata ayînê xwe û xwe  
bi  
xwe digirin, divêt her mirovek jî, heta eger dûrî ayîntiyê jî be,  
hurmeta  
wan û bawerî û dîtînen wan yên ne fundamentalîst bigire.

Lê, li ciyê daxê ye, ko her ji kevin, grupine din jî hene ko ayînî ji rêya wî

derdixin. Nemaze destekên siyasî yên nifişperês û xwedî berjewendiyên

#### 46 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

politîk û desthilatdarên hukumdar ko hewil didin oldariya paqij, pey-

wendiya ruhî ya di navbera mirovî û Xudê de biguhorin û bêxin di rûge-

heka din de. Bi awayekê din û li berçavtir, ew dixwazin ayînî ji bo pirsên

neteweyî û politîk bikarbînin. Yan aşkiratir, ew misilmantî û neteweya

mezin di ramanên xwe de, bi hevcot û timamkerên yekudu dibînin. Mîna di Iraqê de îslam û ereb, di praktîka rojane de bûne yek û li gor vê

û bi dîtina desthilardaran, ereb misilman e û misilman jî ereb e. Xwe, di

rastiyê de, bi vî terzî ereb û faris û tirk bûn xwedî dewlet. Û neteweyine

din jî mîna kurdan ko ji dil misilmantî dikir û bi rastî biratiya erebmisil-

man û farismisilman û tirkmisilmanan dikir û xwe bi hemû ve xistibû ber

xizmeta misilmantiyê, man bê dewleta xwe ya neteweyî. Bi welatê xwe ve

man li bin sitem û dagîrkirina tirk û faris û erebên misilman de.

Min, carna digote xwe »lo, hema eger Quran bikiraya kurdî, baştir dibû û mirovê kurdîzman ew fêhim dikir û dikarî bi zimanê xwe, ne ko

bi zimanekê biyanî, Xwedê xwe biperêse«.

Hindî babê min bû, ew sofî bû, mirovekê pir bi misilmantiyê û Xudê ve girêdayî bû. Nexwendewar bû û ji erebiyê jî bêcgeyî çend wuşeyekan

çi ne dizanî. Tiştê ji gişan jî balkêştir ew bû, ko wî xwendin û nivîsandin

bi yekcarî ne dizanî, lê Quran dixwend û bê çewtî û heziqîn dixwend. Û

piştî çendîn salên xwendina wî bo Quranê, wî ew ezber kiribû. Eger pirsyar jî jê bihataya kirin ka ew xwendin ji bo çi ye eger mirov tênegehe?

Ka ew rist û dêr çi dibêjin? Ka Xudê di wan hevok û ayet û sûretan de çi

şîretan li beniyê xwe dike? Li hember pirsyarên weha ew pir ne rehet dibû.

— Pêwîst nake mirov têbiguhe, lê ya giring ew e mirov kitêba pîroz ya

Xudê bixwîne, babê min dixwest weha hem bêgaviya xwe binixêve û hem

jî me qayil bike.

Xwe pirsya wergerandina Quranê ji erebiyê bo ser kurdiyê yan her zi-

manekê din ne ya gotin û têkvedanê bû. Ne bes babê min lê piraniya mis-

ilmanan û bi taybetî yên ereb, wergerandina Quranê bo ser zimanekê din

bi karekê ne rewa û bi derkeftin ji rêya Xudê dizanî. Bi gotina şêx û mela

û zanayên ola misilmanan, Quran bi zimanê erebî ji ba Xwedê hatiye xwarê û diyar e Xudê ew ziman hejî hindê dîtiye lewma jî divêt ew bi wî

zimanî be û her kes û her nifşemilet wê bi wî zimanî wê bixwînin.

Li gor dîtina wan, divêt peywendî, her bi zimanê Quranê bi xwe, ko erebiy e, bi Xudê re bêne kirin. Bêguman ev çêtirîn şêweyê xwezalkirinê

ye bi ser yên din de.

47

#### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Ez vî babetî bêtir têkve nadim, ew jî ji tirsana ne ko kesek bi çewtî min û

van axiftinên min fêhim bike. Lê mixabin ko kesine weha ko xelet mirovî

fêhim bikin yan hema ew bi xwe, xwe xelet têbigehînin, di hemû deman

de û li hemû cihan hene. Serî li we gêj nakim û we ji kakila axiftina xwe

dûr naxim û we vedigerînim ve bo ser pirsana kerba min û reh û rûşalên wê.

Ew kerb û kîna niha girtina min jî aniye bîra min.

Ez, hîngê xwendinkarê sala duwemîn ya xwendengeha amadeyî li

Mûsilê bûm. Ez, rojekê di kilasê de bûm, dema dergeh bê qutan  
hatiye  
vekirin. Rêveberê xwendîngê ko endamê rêberiya »hizba Be'is«  
bû li  
Mûsilê, hate jor. Çavên wî weko gurekê bîrsî di nav xwendîngarên  
kilasê  
de li pey yekî digeriyan.  
Çaxê çavên wî gihane ser min, rawestiyan, her weko ew bi ser  
nêçîra  
xwe hilbû. Ez, bê derew, pir tirsîyam û hema min hind dît rêveberî  
û bê  
destûr xwestinê ji mamosteyê kilasê bangî min kir. Ez jî, hêbetî, tirs  
di  
lingan de pêçayî, ji cihê xwe rabûm û ber bi derî çûm. Çavên  
xwendîngaran û mamosteyî bi min ve bûn, her weçku wan bi çavên  
xwe  
digote min "haya te ji te hebe!"  
Katê ez gehîştîme derve, dibînim ko li derve, ji rêveberî wêvetir  
çîwar  
zebelehên zilaman, mîna dergehvanên dozexê, li benda min in. Bê  
hîç  
axiftin û bi enî girêyî ber bi min ve hatin. Duwan ji wan rahişte herdu  
çingilên min û ez raheşandime di hundurê landkrozera xwe ya sipî  
de.  
Di wan gavande, qute quta dilê min bêtir lê hat. Di nava min de  
hizrên  
cur bi cur vecemyane ser hev, pirsyar û bersiv hevrûşî hevudu bûn.  
Laşê



min dilerizî û xuhekê ez berdidam bona yeka din min bigire.  
Hindî hatime xwe ko bizanim ka çima wan ez girtime û ka ji ber çî  
ez  
wisa ditirsim, lê min nikarî bersivê bizanim. Xwe, hema ruxsar û  
navçavên wan yên ko agir jê diçû û reftar û kiryarên wan bes bûn  
bona ko  
mirovî bêxin di teqeleyê û tirsê de.  
Ez, di avahiyê polîsê asayîşê »emnê« de li Mûsilê, xistime ber  
paşvebirin  
û qutan û şeq û zilleh û lêdaneka êşdar. Ê wan pirsyarên bê hejmar,  
her  
weçku min gunehkariyeka mezin kiribe, havêtine ber min. Li bîra  
min e  
pirsyara wan ya yekem ko bi gef û gur ji min kirî:  
— Tu dixwazî ko zimanê kurdî di xwendîngehan de bibe zimanê  
xwendinê? Barzanî neşîya wê bike evca tu!? De ka bêje ka tu bi kîj  
rêxisti-  
na kurdî re kar dikî û ka serkêşê we kî ye û ew serên we bi çî pir  
dikin?  
Min xwest wan têbigehînim ko zimanê kurdî weko zimanê  
xwendinê  
di pilana xwendîngehê bi xwe de ye û ew ne tiştê rast e  
tuhmeteka we-  
48 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ha bêxine ser min. Ew bi xwe di rastiyê de jî weha bû; waneya kurdî  
di pi-  
lana xwendinê ya xwendîngehê de bû, lê ew di praktîkê de nebû.

Gelek ji xwendinkarên xwendingeha me kurd bûn û me mamosteyê  
zi-  
manê kurdî jî hebû lê dersa kurdî nedihate dan. Xwendinkarên kurd  
hez  
ji dersa kurdî dikir lê wan bîsteh ne dikir xwe bi hindê bînin derê û  
wê  
daxwaza xwe bînin ziman. Mamosteyê kurdiyê jî ko kurd bû, Xudê  
jê  
razî, tirsinokekê ji qam derketî bû.  
Xwendinkarên kurd her digot ka da em tiştê ji bo vê dersê bikin.  
Evca  
rojê min û bi amadebûna giş xwendinkarên kurd di klasê de, ji  
wan  
xwest ko bi min re bîhên cem rêveberî, bona ko em tev bi hev re wê  
daxwaza xwe sebarek bi zimanê kurdî bêxin ber wî. Lê mixabin, katê  
min  
navê rêveberî û çûnê bo nik wî anî, birader di cih de xav û sist bûn  
û ketin  
ber mihanegirtinê. Hin bê deng man û hinan jî got: ma qey çewtî di  
hindê de ye ka ew ders dibe yan nabe? Heke me gelek zimanê xwe  
bivê  
em dikarin xwe li mal jî hîn bikin û pêwîstiya me bi vê serêşî û  
sergêjyê  
nîne.  
Min çend hewil da wan qayil bikim ko her çend e em kurdîziman in  
jî  
lê her kesek nikare xwe li malê hînê rênivîs û gramatîk û zimanê  
edebî yê

kurdî bike. Ji bilî wê jî xwendinkar di dersa kurdî de kultur û edeb û dîro-

ka xwe nas dike, lê têgihandina wan di rewşa wî wextî de pir dijwar bû.

Tirsê û bê hêvîbûnê ew dagîr kiribûn. Daxwaza min ew bû ko zimanê kurdî jî mîna zimanê erebî buha û rêzdariya xwe di xwendingehê de hebe. Lê, hemû ji qesta û bê hode bû û axiftinên min bi avê de çûn.

Tiştê

ko bi başî hatiye kirin; gotinên min peyv bi peyv gehiştin guhên sîxurên

be'isiyan.

Bes, ma hema wan pê zanî! Ma qey gotineka berûvajî rastiye û xerab ji

devê min derkeftiye! Axiftina min ji çarçûveya pilana xwendingehê û

yasaya dewletê dernekeftibû. Xwe, ne min dersa kurdî xistibû di pilana

xwendingehê û klasa me de û ne jî min mamosteyek jê re destnîşan kiribû. Ez zêdetir serî li we gêj nakim, kurt û kurmanc, ez heft heyvan

mam di navbera emna Mûsilê û emna Bexdayê de girtî.

Sal sala 1975-ê bû. Iraqê û Îranê li Cezayirê peymanê 6ê adarê mor kiribû. Bi wê peymanê serhildana kurd ya çekdar li başûrê Kurdistanê

hate hilweşandin.

Hoye, eger hevsarê me di destê me de nebe; Îrana ko em gerimkirîn,

sinûrên xwe ji me re vekirîn, çekên giran xistine ber dest û xizmeta me,

mebesta wê ji wê çendê bes bi me tirsandina Iraqê bû. Di rastiye de em

49

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

leyistika wan bûn û îhtiyaca kenkeneyên cîhanê, dewletên mezin bi me,

weko kiyan, tunebû.

Mîna ko Îranê xwestî, li dûmahiyê Iraqê hewara xwe bire cem wê û xwe

muhtacî wê kir. Ê weha çêbû; Iraqê ji Îranê xwest êdî arîkariya kurdan

neke. Îranê jî gotê baş e lê mercên min jî hene. Bi wî awayî herdu di-

jminên sersextên hevûdu, ji bo berjewendiyên xwe û ji bo lêdana kurdan

heta eger bo wextekê kurt be jî bûn dostên hev. Îran jî gehiştê miraza xwe

û hinek girav û ava kendawî kete destên wê.

Belê, serhildana kurdan setimî û desthilatdarên Iraqê ketin dest têwer-

danê di Kurdistanê û di jiyana xwecihên wê de. Wê leşkerê xwe, cebilx-

aneyê xwe ya sivik û giran tereberayî seranserê Kurdistanê kirin. Wê çî

qulaç jî nehiştin xwe ne gihandinê.

Wan, bi hezaran kesên ko bi ektîvî kar di raperîn û têkoşînê de kirîn derbiderî başûrê Iraqê kirin, hin jî girtin û hin jî kuştin. Welatê me bi

xwecihên wî ve xiste bin kontroleka rojane ya dijwar de.

Wan bi wê jî bes nekir û xuya bû ko karê wan pilanekirî û programkirî

bû. Her ji destpêka hatina wan bo ser hukmê Iraqê pilaneka dirêjxayen

ya wan bo jinavbirina milletê kurd hebû. Ew berahîk bû û li pey wê ax û

oxên dijwar, wêrankirina Kurdistanê, valakirina wê ji kurdan û xwecihên

din yên wê û erebkirina wê hatin.

Min qala girtina xwe ji were fikir; wan, piştî lêdan û êşandinê û piştî ko

ez kirime nîvmirov û çî axiftin ji min çênekirîn, bera min da.

Xwe, we rastî bivêt, berî zîndankirinê, min ne ji dûr û ne ji nêzîk çî peywendî bi siyasetê ve nebû. Mebesta min, ez ne girêdayî çî rêxistineka

siyasî yan karekê siyasî bûm. Her çend e di rastiyê de xebata mirovê kurd

û milletê kurd ya rojane li dijî sitem û dagîrkirinê û bizav bo bi destveanî-

na azadiyên mirovî û neteweyî bi xwe dibe pirseka siyasî.

Xwe pêdiviye siyaset û siyasetmedarî berî her tiştêkî, di xizmeta mirovî

û milletî de be. Lê dibe jî ko ew, bes berjewendiyên grupekê yan texekê

yan destekekê û çend kesekan bi tenê biparêzin.

Berî ko min berbidin, wan ez neçarkirim ko kaxezeka pirkirî mor bikim. Ev, di kaxezê de nivîsandibû: "Ez Şêroyê kurê Bayezîdî biryara

Encûmena Serkirdayetiya Şoreşê li ser xwe qebûl dikim û eger hat û

xuyabû ko min peywendî bi partiyeka din ji bilî partiya Be'is heye, ez wê

gavê bi wê sizayê qayilim«. Li gor wê yasayê, heke ez yê xelet nebim ez

dibêjim hejmara wê 115 bû, kesê ko wê kaxezê mor bike û bête zanîn ko

di partiyekê de ji bilî partiya Be'is de kar dike, dê sizayê wî bê mehke-

50 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

mekirin xendiqandin be.

Piştî ko ez hatime berdan, êdî xwendingehê ez wernegirtim. Mihaneya

wan jî ew bû ko ez ji xwendinê veqetiyame û beşdarî taqîkirinên sala der-

basbûyî ne bûme û di destpêka sala nû ya xwendinê de amade nebûm û

dereng hatim. Ji bilî wan herdu bihaneyan, wan ez bi casûsê Îsraîlî û

cuhiyan li qelem dam.

De were lo, wisa bi hêsanî, ez yê ko ne Îsraîl û ne jî cuhîyek bi tenê jî di

hemû jiyê xwe de bi çavên xwe dîtî, kirim casûs û sîxurê wan. Belê,  
ew,  
weha bi hêsanî, dikarin navê her kesekî bilewitînin û bi kesekê  
nebaş û  
xwefiroş û paşvero bidin zanîn.  
Di Rojhilata Navîn de û bi taybetî di welatên ereb û misilman de,  
sîstemên hilsengandina tiştan û bûyer û mirovan, ne weko  
sîstemên  
hilsengandinê ne li cem miletên din yê cîhanê. Sîstemê niha her  
yê berê  
ye; çawa hukumet û tevgerên siyasî û dînî yê ereb û welatên  
misilman û  
hukumetên wan û dezgehên ragehandinên wan berî çendîn salan  
ew  
hevîrkirine, her nuke jî weko xwe ye û çî ya wesa jê ne hatiye  
guhertin.  
Weku mînak, çaxê desthilatdarên van welatan kesek yan grupek  
nevêt  
û bixwazin wan di civakên xwe de îzole û veder bikin û paşî wan  
jinav  
bibin, dê tuhmeta xwefiroşî û siyonizm û casûstiya Îsraîl û  
împeryalîzmê  
pêvenin. Bi wî awayî rêya jinavbirina kes û grupên weha li ber wan  
pir  
asan dibe, ji ber ko piştî propagandeyeka weha, dê piraniya civakên  
wan  
bêjin ko ew kes Xudênenas e, çimkî xizmeta cuhiyan û Îsraîlê û îm-  
peryalîzmê dike.

Di sîstemekê weha yê hilsengandinê de, ko di çendîn salan de  
hatiye  
durustkirin û ji ber dîwarên li dormandorî civakê çêkirîn, çav û  
mejiyê  
xelkî dûrtir naçe. Di egera sîstemekê weha yê hilsengandinê de  
rayeka  
giştî çêdibe, guhertina wê ne hêsan e û di piraniya caran de,  
mixabin, hêz  
berê wê, her çend e ber wext jî be, diguherîne.  
Xwe dewlet ne dewleta yasa û dadgehan e ko mirov bikaribe bi rêya  
dadgeh û dezgehên ragehandinê berevaniyê ji xwe û mafên xwe  
yên  
mirovtiyê bike. Evca sed hezar rehmet li wî kesî bin yê ko dibe  
tîrman-  
ca wan û dilreşiya wan.  
Di pîvana desthilatdarên Iraqê de, ew kes bi tenê pêşvero ye yê ko  
be'isî  
be yan bawerî bi ideolojî û bîr û bawerên wan hebe û bi çî renekî  
li hem-  
ber wan û gotin û kirinên wan raneweste. Li cem van azadiya bîr û  
baw-  
eran jî heye, lê azadî di navbera du alternatîvan bi tenê de; yan  
be'isî û  
serçemandin bo wan yan jî jinavçûn û neman.

51

KURÊ ZINARÊ SERBILIND



Ev jî azadiyeka taybetî ye ji devera me ya Rojhilata Navîn re. Ev mod-  
êla azadiyê, di welatên devera me û hemû cîhana paşkeftî de, pir caran û  
bi mişehî û berfirehî tê dîtin. Ev, li cem deshilatdaran û bi taybetî yên  
cem me, tiştêkê pir normal û rewa û di ciyê xwe de ye. Manê gez û meqes  
di destên wan de nin û ew çilo dixwazin wilo dikan. Kurt û kurmanc ez ji  
xwendinê hatim bê par kirin.  
52 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

–7–

Xuya ye bes tiştine xembar û dilêş tîn bîra min; li vir girtîgeha emna giştî  
ya Bexdayê tê bîra min. Roja min ya yekemîn bû di girtîgehê de, ko gir-  
tiyan zanî ez kurd im, ji nav wan, yekser, yek rabû û ber bi min ve hat.  
Zilamekê reşesmer, bejin dirêj û teşimkeka tarî li ber çavan. Wî bi xêrhatin li min kir û xwe weha da niyasîn:  
— Ez Îbrahîm Ebdulxaliq im  
Girtîgeh ji korîdoreka dirêj ya gelek teng pêk dihat. Çend odayek tê de  
bûn, lê deriyên wan her tim daxistî bûn. Di wan mezelan de kesine ko ew

naxwazin bi çî kesekî re bipeyivin û li cem wan mirovine xeter in bi ten-

hayî tên îzolekirin. Bi kutekî, di wî korîdorê firehiya wî nîv metir de, ci-

hê girtiyan bi rûniştin û nîv razanê di herdu aliyên de dibû. Kes ji me ne

diwêriya bi yê din re biaxive. Kit û mat jî hebûn ko ji derketina xwe bê

hêvî bûbûn, evca wan guhdariya yasa û rêdarên girtîgehê ne dikir û danu-

standinên xwe bi hevudu re didomandin û qala her tiştêkî bi girtiyên din

re dikir.

Her roj piştî seet dehî şevê, girtî giş di cihên xwe de matmayî diman, guhên xwe vediçinîn; ka dê îşev navê kê bête vexwendin û dê gera kê û lê-

dan û îşkenceyê be. Ev jî, ji ber ko piraniya vekolîn û lêdanan pey seet neh

û dehî şevê dest pê dikir û carna heta seet şeşî spêdeyê jî vedikêşa. Seet nehî şevê bû, dema bo cara yekem ez ketime hundurê wê îşkencegehê.

Piştî derbasbûna çend deqîqeyekan û piştî ko wî nav li xwe nayî Îbrahîm Abdulxaliq, wî devê xwe anî ber guhê min û got:

— »Ez dizanim baweriya te bi min nayê û ew tiştêkê normal e û belku

jî baş e ko tu bawer ji min nakî, çunkî divêt mirov di girtîgehan de li ber

devê xwe rabiweste û haya wî ji gotin û reftara xwe hebe. Lê , ez dixwaz-

im şîretine li te bikim û pêwîst nake ko tu bersiva min yan komentarekê li ser bidî.

Dibe ko îşev yan şeveka din gera te û lêkolînê be. Dê te bi pirsyar û got-

gotk û xweşxweşk û êşandinê pir mandî bikin. Mebesta wan ew e ko tu

53

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

zû hem bi laşê xwe ve û hem jî bi wûreyên xwe ve mandî bibî û ji hev

bikevî. Ew jî, bona ko tu li gor dil û daxwaza wan bipeyivî û bikî. Ya gir-

ing ew e ko tu bawer ji wan nekî û rê nedî ko metodên wan te di serde

bibin û wenekî ezmanê te bitehise wê çala ko ew te radikşîninê.

Weku nimûne; dê ji te re bêjin ”tu biaxivî yan neaxivî em rastiya te dizanin û eve daxuyanî û îtîrafên hevalên te li ser te, lê eger tu bi devê xwe

daxuyaniyê li ser xwe û hevalên xwe bidî hîngê dê sizaya te kêmtir be û tu

hew tê êşandin. Ê eger tu amadebî ko bi me re kar bikî, hema em, her ji

nuke çavên xwe li ser vê pirsê diniqînin û em bi başî, weko yekî ji xwe,

çavê xwe didin te”. Dibe ko dengî ji kaxezan bînin û bibêjin te ”aha  
ev in  
daxuyaniyên hevalên te”. Tu bi xwe nikarî wan bibînî, ji ber ko  
çavên te  
dê bi pateyekî bêne girêdan û hema tu bibînî jî ma qey li cem wan  
pir  
zehmet e ko ew daxuyaniyan bi destên xwe û bi navên kesine din  
çêbikin!  
Baş haydar be û guh nede derewên wan. Ez nizanim û naxwazim tu  
bibêjî jî ka te tiştê kiriye yan na, lê bi her hal, divêt tu bo tişt û  
daxwazên  
wan bibêjî na. Xwe li ber qutanê bigire, sist nebe û xwe di gotinên  
wan  
negehîne. Hema xwe bi rastî xişîm bike û xwe weko mirovekê gêl  
bîne  
pêş. Çi axiftinan li ser xwe nede û eger heta dawiyê, te xwe ragirt û  
tu li  
ber wan mukum û girtî mayî, bi aneha Xudê tu dê ji dest wan qurtal  
bî.«  
Gotinên wî baş di guhên min de nediçûn xwarê, ji ber ko min bi çavê  
tirsê û gumantêbirinê li wî dinerî. Min gote xwe dibe ko ew yek be  
ji sîx-  
urên ko bi wî awayî axiftinan ji girtiyan çêdikin, lewma min gotê:  
— Xwe min çi nekiryê ko bitirsim û ez fêma nakim ka çima tu şîreta  
li  
min dikî?  
— Ji ber ko tu kurdî, wî got. Baweriya min jî gelek bi kurdan tê.

Mêrxas in, çi cara serên xwe li ber zordaran ne çemandine. Ez, ji bilî vê,  
xwe li hember kurdan bi gunehkar dibînim. Min jî, di wextê xwe de, gelek tadarî li kurdan kiriye. Min ew di van girtîgeh û zîندان de gelek  
azardane. Ez, niha, di rojên xwe yên dawiyê de, dixwazim bi her çi awayekî be barê gunehên xwe sivik bikim û wujdana xwe rehet bikim.  
Ez ne peyivîm û ez di hindê jî ne digehiştim ka wî çawan di vê zîndana  
niha ew bi xwe tê de girtî, wextekî kesine wekî min êşandine. Ji min re bû  
merek ko bizanim, lê wî pirsyara min ji devê min nebihîst, lê di hêbetbû-  
na dêmê min de dît, lewra vêre çû û got:  
— »Dibe ko tu niha ji xwe dipirsî ka ez van tiştan hemûyan ji kûderê dizainim û ka ez kî me yan durustir kî bûme. Te ya rast bivêt ez bi xwe jî  
yek bûm ji endazyarên vî sîstemê vekolîn û îşkencedanê.

#### 54 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Ez berî sala 1968-ê serokê şaneyeka serekî ya be'isiyan li Bexdayê bûm.

Seddâm Huseyn û Nazim Gizar du endam bûn di wê şaneya min de. Cirre û kêşmekêş û şeredevên min bi wan re bê dawî bûn.

Wan yek dîtina hebû û ne diguhert, dîtina wan jî ew bû ko pêngava yekemîn di siyaset û şoreşeka durust de, sexmeratî welatekê avatir û

xweştir û komelekê bextiyar û pêşkeftîtir, ew e ko millet hemû bibe  
be'isî

û yê be'isî nevên û bawerî bi be'isiyan nebe û be'isî nebe divêt ser  
lê bête

pelixandin. Eve hizra wan bû, di wê demê de ko hê em nehatibûn  
ser

hukmî. Ê di wî çaxî de, ji bona ko em desthilatdariya Iraqê bêxin di  
destên xwe de, pêwîstiya me pir bi hevkarîyê bi opozisyona li dijî  
hukumetê hebû.

Wan herduyan pir hez ji şera û lêdan û kuştinan dikir û bi dîtina wan  
hêz hemû probleman çareser dike. Tiştê ko hîngê bala min kişandî  
ser

xwe, mijûlbûna Seddamî bû bi xwendina pirtûkên polîsî û yên şer û  
casûsiyê digel yên qanûnî. Wî, weha, hezkirina xwe bo bikaranîna  
hêzê û

bo jinavbirina hevrikên xwe, bi wan pirtûkan têr dikir. Her wisa jî  
şehrezahiya xwe di wî warî de pêşde dibir.

Ez dibêjim yên qanûnê jî bi mebestekê dixwendin; ka ew çawan  
qanûnê, bi xwe, bixapîne û ka çawa çi şop û şûndestan li pey  
kiryarên xwe

nehêle, bona ko qanûn nikaribe wî zebî bike.

Dirêj nakim, ez, her di destpêkê de, rêveberê komîteya yekemîn ya  
vekolînan ya ser bi partiya Beis bûm. Min jî, bi wî rengî, para xwe di  
avakirina vî dar û destê niha yê vî dezgehê êşnadin û terorkirinê de  
hebû.

Bêguman li ber te ne zelal e ka ez niha li vir çi dikim. Evê jî çîroka  
xwe

heye û kurtiya wê ev e: »Piştî hatina me be'isiyan bo ser hukmî li Iraqê.«

Peyva be'isiyan bi rengekê weha got, jê xuyadibû ko ew hêsta şanaziyê

bi hindê dike ko endamekê wê partiyê bû û min hest bi xwe kir ko min

kerb ji wî hilgirt, çaxê wî ji min re diyar kirî ko ew jî yek bû ji zebaniyên

îşkencedanê. Ew li ber dilê min pir giran bû û xwestika min ya wê gavê

ew bû ko ew devê xwe bigire û xwe ji min bide paş. Lê wî qet xwe di hindê

de nedigehand û dom da axiftina xwe:

”Her ji destpêkê, Seddamê çeqokêş xwe di partiyê de kire zepzepek û

serkirdayetî hemû bi şexsiyeta xwe ya vala û ya req tirsand û dest pê kir

partî ji rêya wê ya destnîşankirî derxist. Wî, ew li gor dilê xwe birêvebir.

Ez li dijî piraniya dîtin û lênerîn û kiryarên wî rawestiyam. Lê Seddam

ne di xema hindê de bû û guhên wî li ber axiftin û dîtin û pêşniyarên me

hemûyan girtî bûn. Zimanê wî hêz bû û qîmet nedida çi kesekî û xwe bi

55

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

xelaskerê ereban da niyasîn. Kesê ko rexneyek li wî girtiba û li dijî  
wî  
rawestaba, da hema hind hête zanîn ko ew kes hatiye kuştin. Me  
dizanî  
ko Saddam e yê ko wan dikuje, lê çî kesekî guh nedida me û ne  
dixwest-  
in wê ji me bawer bikin. Piranî ditirsiya û xwe diparast.  
Min û çend kesekan û bona ko rêyê li ber wî û wê siyaset û harbûn  
û  
serxweriya wî bigirin, grupek li dijî wî di hizbê de çêkir. Ez serokê wê  
grupê bûm û li dawiyê me xwe bi be'isiyên Suriyê ve girêda, bona  
ko  
arîkariya me bikin û her weha baweriya me ew bû ko divêt partî yek  
be;  
qiyadeya neteweyî yek be û qiyadeya dewletê cuda be. Saddamî bi  
me  
zanî û bi wî rengî dijminatiya di navbera me de diwartir lê hat.  
Polîsên  
xwe yên taybetî xistibûn pey min û wan gav bi gav dizanî ka ez çî  
dikim  
û wî dixwest belgeyekê li dijî min bi dest xwe bixe bona ko pê  
bikaribe  
min li atafekî bide.  
Ez spêdeyeka havîna 1974-ê li çayxaneyê Elreşîd rûniştibûm û çayek  
li  
ber min bû, min ew vedixwar. Lîsteya navên endamên rêveberiya  
rêxisti-



na me jî di dest min de bû, min lê dinerî û li benda hevalemî jî bûm  
ko bê  
û wê lîsteyê bi xwe re bibe Sûriyê. Di wan navbeynan de, ji aliyê din  
yê  
cadeyê, du efserên ko min nas dikirin xuyabûn û çaxê çavên wan bi  
min  
keftin, wan pêyên xwe siviktir lêkirin û ber bi min ve hatin.  
Min yekser zanî ko Seddamî ew şandine û xuyabû ko wî bi lîsteyê  
zanîbû. Loma min, her zû û hê ew negehiştin cem min, lîste kire  
balolke-  
ka biçûk û havête di hundurê devê xwe de û min ça bi ser de kir û  
qurçek  
li gewriya xwe da û balolk palda xwarê. Herdu efser gehiştin ba min  
û bê  
silavkirin ji min pirsîn:  
— Ka lîsteya rêxistina we ya ko tu dê îro hinêrî Sûriyê? û wan got  
min  
ko ew kesê da lîsteyê be, bi xwe agahdarî daye Seddamî.  
Min jî gote wan:  
— Fermûn eve ew di zikê min de ye û min weha baş vecûye heta  
eger  
ez niha birîm jî, çi ya weha jê namîne ko hûn wecekê jê bibînin.  
Lê xuya bû biryar hatibû standin, lewma wan dest dan çingilên min  
û  
her di eynî gavê de yekî ji wan destê xwe li ototmobîlekê, ko li  
benda fer-  
mana wan bû hijand û ez kirime tê de û ez bi wî rengî hatime girtin.  
Evca ez yê ko karê wî vekolîn û îşkencedana girtiyan bû, ketim ber

vekolîn û bin lêdan û azardanê. Qet di hizra min de nebû ko ez rojekê

bibim girtiyê vê girtîgehê.«

Teşimka xwe ya reş ji ber çavên xwe hilanî û destê xwe yê rastê danî ser

çavê xwe yê rastê yê fetisî û got:

56 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— »Ev çavê min, di çaxê îşkenceyê de, hate korekirin. Ez bi pankeka bersîvandeyan ve hilawîstibûm, dest û pêyên min bi pankeyê ve girêdayî

û berê nacçavên min û sînga min ber bi jêr. Panke hilkir û wê ez bi hêz

dizivirandim û ji nişîv jî ve qamçiyên wan bi dijwarê bi laşê min yê tazî

diketin. Gelek caran dirbên wan ev çavê min yê rastê hingaft û ew li min

fetisand.

Eger bi gotina Seddamî bûya, diviyabûya wan, ez derhal kuştibama. Lê

Ahmed Hesên el-Bekir li dijî kuştina min bû. Ew jî vedigere bo dapîra min ko dayîna zarokên el-Bekrî bû. Ew di mala el-Bekrî de bû û sexbêriya

zarokên wî dikir. Evca maytêkirinên dapîra min û paşî yên el-Bekrî wenekir ko ez bême xendiqandin. Lê, di derheqê min de sizaya bîst salan

zîndankirin hate dan.

Lê weko min gotî, Seddam ji ya xwe nayê xwarê û ji wî rikota  
nebûne.

Kela wî bi wê sizayê ne rişt û di zîndana Ebû Xerîb de li ber digeriya  
bo

ko bihaneyan li min hilbêxe bona ko min pê bide kuştin. Wî digote  
Hesen el-Bekrî û hevalên din ko ez, şikra min, ji Ebu Xerîb bi xwe jî,  
pey-

wendiyan bi Sûryê dikim û ji zîndanê name û lîsteyan ji wan re  
dişînim.

Wan, elek caran di zîndanê de, bi rêya duktorê didanan, hewildan  
min

jehrî bikin, lê ser negirt. Ez, her ji ber hindê jî niha li vir im û ez di  
wê

bawerê de me ko ez êdî hew bi saxî ji vêderê derdikevim.«

Di çaxê ko ew dipeyivî, min çavên xwe li ser wan dêmên şikestin tê  
de

xuya û li ser laşên azardayî û bê hêz û telaşbûyî wê korîdorê  
digerandin û

hate bîra min gotineka pêşînanan ko dibêje: »Yê telhekê li ber  
birayê xwe

vene dê her ew bi xwe kevitê«. Ev yek ji wan ejdeharên ko mirovên  
weko

min, bê guneh, di girtîgehên xwe de dihincinîn, îro ew bi xwe girtî  
ye û

ew bi serî tê ya ko wî bi serê hinekan dianî.

Her wê şevê, seet deh û bîst, navê min hate bang kirin. Celbiyan  
berî

her tişteki destên min ji pişt ve û çavên min girtin. Paşî min hind dît  
pe-  
hînek li pişt min keft û ez tîw tîw rahavêjtim. Min ne dizanî ka min  
ber  
bi kûderê dibin. Wan celbiyan, di rêya birinê de henekine çivêl bi  
min  
dikirin û ez kiribûme pêrankê xwe.  
Dirêj nakim, lê bi rastî vekolîn, her wekî wî Îbrahîmî gotî, bi min hate  
kirin. Min weha hest pê fikir ko ew bi xwe ye min diêşîne û bi pêyên  
xwe  
yên bi gemar diçe ser laşê min û min ji xwe re dike gok û pê dileyize.  
Wan  
geh bi zilleh û şeq û pehîn û pencere û pankê û geh jî bi xoşxoşk û  
awayê  
diserdabirinê, ez azardidam. Daxwaza wan ew bû ko peyva erê ji  
devê  
min derbikeve, yan jî ez ,bi hijandineka serê xwe, gotinên wan erê  
bikim.

57

#### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Lê ruh şîrîn e û hindî ji dest mirovî têt mirov li ber xwe dide ko ji  
mirinê  
qurtal bibe û xwe tûşî wê neke. Lewma, ewende wan bi min re  
hovetir û  
dirundetir reftar dikir ewende ez bi hêztir dibûm û kerba min li  
hember  
wan û wan reftarên wan mezintir dibû.

Belê, ez li ser darsa zimanê kurdî, heft heyvan di wê îşkencegehê de mam. Piştî ko wan hemû nifşên êşandinên xwe yên kevin û nûjen li ser

min û laşê min bikaranîn û piştî ko wan ez baş li zirkê dayîm, wan ez berdram. Ez, ji wê hovexana wan, derkeftim mirovekê din; dizane ko kabûsekê kujek li ser sîngê xelkê welatê wî rûdine û xwîna wan dimêje.

Piştî ez derkeftim, min ji nû buhayê azadiyê û azadî bi xwe nas kir.

Min

zanî ka xebat ji bo azadiya her mirovekê çend giring e. Belê, min ji nû baş

fêhim kir ka ew çima mirov û milletên bindest û perîşan xebatê ji bo azadî

û serxwebûna xwe dikin.

Di wê zîndanê de gelek kurd jî hebûn. Zimanê axiftina me jî bi hevudu

re çav û dêmên me yên xemgîn û kesîre bûn. Ji nav wan kurdan yê ko bala

min bêtir ber bi xwe ve kişandî kesaneke bû bi navê Ezîzê Siloyî. Ew jî ji

devera me bû.

Roja min ya sêyê bû di wê zîndanê de, dema spêdeya wê rojê piyawekê

pir bi xwe ve, bejin dirêj, navçav sipî, çavşîn û xudan porekê reşêvebûyî

bersinga min girtî û bi çavên xwe yên boq hêvkire min û got:

— Tu kurdî, mane? wekî kesekê bawernekirî, pirsyara xwe kir.

— Belê, we ye, min welama wî da.

Hêj wûşeya belê we ye bi timamî ji devê min dernekeftî, wî xwe bi şewqeka pir bi hêz di min werkir. Ez weko kesekê pir nas û nêzîkî xwe ko

demeka dirêj e nedîtiye himbêz kirim. Wî, ez du sê carekan ji rûçikan ve

maç kirim. Hema her ji wê gavê ew mirov kete dilê min û wan çend peyvên wî yên kurdî dilê min pir şa kir. Her weçku wê gavê hemû gelê

Kurdistanê li hawara min hatî. Bê tirs diaxift û çavên wî bi rengêkê namo

ji min venedibûn, her weko ne dixwest min ji dest xwe bide.

— Hema mirovê kurd ji dûrve yê diyar e, wî got. Dêm û navçavên te yên kurda nin. Bêhna welatî ji te tê.

Paşî, min her ji wî Îbrahîmî zanî ko Ezîzê Siloyî çend heyvek in di zîndanê de ye. Îşkencevan, wî her çend şevêkan carekê dibin vekolînê û têx-

in ber amîrgeha xwe ya êşandinê.

Wî heta niha xwe li ber girtiye û nikaribûne çî axiftinan jê çêbikin, lê

hiş di serî de nemaye û mîna teledînan lêhatiye. Wî Îbrahîmî digot ko ew

li ser kirîn û firotina çekî hatiye girtin. Digot ko wî pey karesata 1975-ê

58 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

gelek çek kirîbû û nabêje ka wî çî li wî çekî kiriye û ka li kîderê veşartiye.

Rojekê Ezîzê Siloyî xwe nêzîkî min kir. Ew gelek lawaz bûbû û bi kut-

tekî xwe li ser pêyan digirt. Kincên wî di ber de, bêguman ji ber îşkencedanê, peritî bûn. Wî pirsyara navê min ji min kir û ka ez ji kîj gundî me û kurê kê me. Wextê min bersiva wî dayî, derkeft ko wî babê

min nas dikir û got ko ew, şikra babê min, mirovekê mêrxas û pirbaş bû

û got ko ew, şikra xwe, gelek caran li gundî û li Mûsilê jî li cem me bûye

mêhvan.

Diyarbû ko wî dixwest tişteki bibêje, yan hema ya di nava wî de ketiye

serêk vala bike û ez bi dest wî ketibûm, lewma ji nişkan ve got:

— Min neçar dikin ez kaxezekê mor bikim.

Min xwe di wî de didît lewma bê hizirkirin û bê tirs ez pê re, bi dengêkî

pir nizim, di bin lêvan re peyivîm:

— Tu dê îmza bikî?

— Duhî, her weko dixwest bîne bîra xwe ka duhî çi kiribû, duhî min mor kir.

— Çima te mor kir? min jê pirsî.

— Çi nemaye ko bi min re nekirî, dengê wî pirî xem bû, wan zanî ger ew min bikujin jî ez çi nabêjim, lewra duhî ez dirêjî ser mêzekê kirim.

Ronahiyeka geş xiste ser çavên min ko nikaribûm wana vebikim. weko

her roj şîrînqeyek li zendikeka min da. Xwe te ya rast bivêt, ez pir rehet

dibim dema ew wan şîrînqeyan li min didin. Nizanim çi piştî wê şîrînqeyê qewimî. Ew bi xwe, ez, piştî wan şîrînqeyan, pir kêfxweş dibim,

şeper, çeng bi min ve çêdibin û ez di beheştekekê de difirim. Nizanim  
ka ew

ji wan şirînqeyan e yan jî xewn in. Lê min duhî dizanî tiştekekê mîna  
qele-

mekî di destê min yê rastê de raheşandiye û kesekî du sê caran ew  
destê

min yê giran li ser tiştekekî wekî kaxezê livand. Piştî hîngê min hind dît  
spêde ye û ez li vêderê, di nav girtiyan de me. Ez carna dibêjim xwe  
dibe

ko ew hemû xewin bin û carna jî dikeve serê min ko rastî be.

We rast bivêt wê saloxdana mam Ezîzî ez di nav xwe de pir  
tirsandim.

Min hêdî hiçkê wî yê destekê wî hilkişande silal, dibînim ko zendika  
wî

pirî nîşanên weko kulan e û her weha zendika destê din jî. Diyarbû  
ko

wan pir caran narkotîk xistine laşê wî û narkomanek jê çêkirine  
bona ko

bi wî awayî axiftinan jê çêbikin.

Piştî ko min guhdariya serpêhatiya mam Ezîzî kir û laş û zendikên wî  
dîtin, bo min ronî bû ko desthilatdarên girtîgehê her tiştekekê  
bixwazin, bi

59

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

serê girtiyan tînin û xwe ji çi nadine paş, ji ber ko destûr ji silal ji wan  
re

hatiye dan.



Belê, ew cîhaneka taybetî ye û desthilatdarên girtîgehê û gotin û hezkir-

inên wan qanûn in û dînatî ye mirov li wir qala mafê mirovî û ji mirovî

re hebûna advokatekî bike. Li wê derê yek kes hakim e; ew bi xwe dad-

girê giştî ye, polîs e, îşkencevan e, advokat e û hemû ye, ew jî desthilat-

darên girtîgehê ne. Ji min re xuya bû ko metodine din yên wan hene ko

bikartînin; weko narkotîkê. Bi terzekê zêdeyî taqeta mirovî bi şirîngeyan

didin girtiyan. Bi wî rengî girtiyan baş dişkênin û nizim dikin û bi narkotîkê ve girê didin. Piştî ko ew baş girtiyan ji axiftinan dadiqutin,

wan ji nav dibin.

Ezîzê Siloyî li ser destên wan û bi wan metodên cur bi cur yên wan pir

lawaz û bêserûber bûbû. Wî bê hezikirna xwe, bê viyan û îradeya xwe

biryra nemana xwe mor kir.

— Ez bawer nakim êdî çavên min derveyî vê derê bibînin.

Piştî ko wî ev gotî heyamekê ma bê deng û li min nerî, weko kesekê berî

ko tişteke xeter bike û hizra xwe tê de dike ka bike yan na û ka çawan pên-

gavan pavêje, hêdî û li ser xwe got:

— »Guh bide min. Ez dê ya rast ji te re bêjim« devê xwe baş anî bin

guhê min. »Ne min çek kiriye û ne jî firotiye. Lê li dema ko şoreş  
şikestî  
û pêşmerge neçarbûn xwe bidin dest Iraqê, hîngê min û hevaline  
pêşmerge, biryar da ko çekên xwe nexin destên hukümetê. Biryar  
ew bû  
ko em çekên xwe pêkve li devereka nepenî, nêzîkî sinûran  
biveşêrin. Ew  
jî ji bo hindê heke hat û em bêgav man û neçarbûn ko di rojekê ji  
rojan  
de berevaniyê ji xwe bikin, em wî çekî bi kar bînin.  
Xwe tu dizanî hîngê wê heşameta pêşmergeyan ew çiyayên çekî  
danîn  
ber destên leşkerê Iraqê û me ne dixwest em jî weha bikin.  
Baweriya wan  
hevalan jî gelek bi min û birayê min dihat, lewma hemûyan çekên  
xwe  
danîn cem me, bona ko ez û birayê min wan li cihekê ne li ber çav  
biveşêrin. Ê ew bi xwe çûn Duhokê bo ko xwe bidin dest hukümetê.  
Me  
jî ew çek di goristanekê de veşartin û paşî me jî weko piraniya  
pêşmergeyan berê xwe da ber bi jêr û hukumeta Iraqê, lê bê çek.  
Piştî  
çend rojekan, her hê em li Duhokê, ez û birayê min hatin girtin.  
Xuya bû  
yekî ji wan hevalan û bona ko xwe li ber hukümetê şirîn bike, îxbarî  
li ser  
me dabû. Hindî birayê min bû, ji min biçûktir bû û ya ji hemûyan jî  
xer-

abtir ew bû ko wî êşa dilî hebû. Dilê wî gelek diêşiya û carna bêhna  
wî pir

teng dibû û pê dihate halê mirinê. Wî xwe pir li ber îşkenceya wan  
negirt

## 60 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

û her di vê zîndanê de û dema em şevê ji qutanê vegerandîn ve  
vê derê,

êşa dilî li ser zalbû û bêhin lê malîq bû. Paşî bêhin bi yekcarî lê çik  
bû û

êdî bêhna wî ne hat û ne çû û weha mir. Pergala min jî ev e ya ko tu  
min

tê de dibînî.

Guh bidê! Min heta niha nihîniya xwe ji çi kesekî re aşkira ne kirye  
û

min biryara xwe daye ko ez ji te re bêjim. Tu kesê yekemîn û paşînî  
ko dê

guh li vê nihîniyê bibe û ji xwe re bo rojeka pêwîst bihêle. Lê, şîreta  
min li

te ew e ko ew çek bo çi xerabkarî û kuştinên navxwe neyên  
bikaranîn, ew

çek bes bo berevanîkirinê ji xwe û welat û milletê me be li hember  
tadarî

û destdirêjkariyên van mêtinkar û tuximperistan.«

Wî weha zû çîroka veşartina wan çekan ji min re vegêra, her weko  
di-

tirsiya di her navbeynekê de celbiyên wî bihên û wî bibin û paşî ew  
nihînî

digel wî biçe û bin ax bibe. Wî qala goristanekê kir ko dikeve navbera

gundên Bazê û Kanîmezî û Çemseyda li devera Berwarî Bala. Got jî ko

pênc gor li dormandorî mezintirîn darmaziyê hene û wan çek di wan pênc goran de şardiye.»

Li vê derê, Şêroyî nivîsandin qut kir û kete hizra wî çekî û aya ew çîro-

ka mam Ezîzî jê re gotî rast e û eger rast be erê gelo hê ew dar maziya

mezin ko nîşanek e bo biserhîlbûnê bi ser wan goran de li cihê xwe ye û

ne hatiye birîn.

Ya ko bala wî bêtir kişandî ser pîrsa wî çekê veşartî saloxdanên şevê bûn

yên ko wan karwançiyên yên ko ji nav Berwarî Bala dihatin, vegêrayîn.

Wan axiftinan ew xiste di teq û leqê de. Wan digot ko leşker û emn û

muxaberat û polîsên Iraqê bi dilê xwe ketine deverê û wan xelik pir perîşan kiriye. weko kurd dibêjin ”pişik li mal nîne, navê mişkî şahîn e.”

Wan digot ko leşkerê hukümetê bi berdewamî gundan radike û şûnwarên wan jî nahêle, wan bi yekcarî û bi hemû ve jinav dibe. Digotin ko

wan li ber e Kurdistanê ji kurdan û kêmeteweyên din vala bikin û ere-

ban li şûna wan nîştece bikin. Digotin li her gundekî hêj nerakirî,

hukumetê li gor dilê xwe, kefxuyek "muxtarek" xistiye ser difna  
gundiyan û divêt ew kwîxwe her roj spêdeyê zû biçe "nahiyê" û hûr  
û  
girên li gundî qewimîne bigehîne guhên desthilatdarên hukumetê li  
wê  
derê.

Digotin xinizî li hemû cih û qujbin û qulaçên welatî, çi ji tirsê û ji bo  
parastina xwe û çi ji pêxemetî pere û mezintiyê pir mişe bûye. Ji  
aliyekî ve  
pêşmerge nemane û ji aliyê din ve xelik bê pişt û bê hêvî maye.  
Hukumetê jî ew nebûna pêşmergeyan bi delîveyekê pir baş, ji xwe  
re û ji

61

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bo bicihanîna pilanên xwe dît û nexwest bi hêsanê ew derfet ji dest  
wê  
biçe. Bizava wê ya herî mezin ew bû cihê pêyên xwe di Kurdistanê  
de baş  
çê bike, xweş bike û bi hêz bixe.  
Ji bilî Şeroyî, sê xurtên din jî, ji başûrê Kurdistanê li wê zomê bûn.  
Ew,  
pey şikestina şoreşa Eylûlê hatibûn wî aliyê welatî. Yek ji wan  
Segvan  
Mizûrî bû. Segvan, pêşmergeyekê mêrxas bû. Wî piştî setimîna ser-  
hildana çekdar xwe neda dest hukumeta Iraqê. Wî xwe di çiyayan  
de asê

kir û wan dawîyan berêveyî wî aliyî bûbû û li wê zoma Şêro lê  
rûdinişt di-

ma. Ew bi xwe mirovekê pir livok û civok bû û hewyana wî bê xebat  
û

lebat nedihat.

Gencê duwemîn, Bêwar Berwarî bû. Ew, di serkirdayetiya şoreşa  
Eylûlê de pêşmergeyekê ber bi çav bû. Ew jî, piştî nemana raperînê,  
ket

pey serkêşiyê û berê pêyên xwe da Îranê. Lê, li wê derê, Savak û  
ordîgeh

û perîşanbûneka din li benda wan bûn. Ê ew, ji zordariya  
desthilatdarên

Iraqê nereviya bû bona ko biçe bin barê zordariya Îranê, lewma jî  
nikaribû serî li ber daplosînerên nû biçemîne û hê du hefteyên wî li  
wir

derbas nebûyîn, sinûr qetandin û vegeriya başûrê Kurdisatanê. Car  
bo

car û ji bo bêhinvedanê diçû wan zozan û gundên bakûrê  
Kurdistanê.

Xurtê sêyem, Dildar Gulî bû. Babê Dildarî pêşmerge bû. Ew di şerê  
1974-ê de, di eniya şerî de, di bersîngirtina êrişa hêzên çekdarên  
Îraqê bo

ser Kurdistanê de, hate kuştin. Bombeyeka balafirên Iraqê kete  
nêzîkî wî

û ew jî kete ber teqîna wê. Dildarî pir hez ji babê xwe dikir û babê  
wî jî

bes ew kurê xwe bi tenê hebû û wî hindî dinyayekê hez jê dikir.  
Dildarî li

ser gorê babê xwe sînd xwaribû ko çî cara xwe nede bin sîbera  
kujekên

babê xwe û hindî jê bihêt, ji bo nehiştina rejîma Seddamê kurdkuj  
xebatê  
bike.

Her çend e kurdine din jî ji başûrê welatî li wir bûn, lê  
danûstandinên

Şêroyî bêtir bi wan hersê kesan re hebûn. Lewma Şêroyî xwest wê  
dîtina

ko li cem wî çêbûyî bi wan re munaqeşe bike. Dîtina wî jî ew bû; li  
dijî

dijminekê sersext û dijwar û li dijî sitem û zordariya wî dijminî,  
pêwîstî

bi berxwedanê heye. Berxwedan jî di rewşa îroyîn de bi awayekê  
xuya di

bajaran de nayê kirin û ew jî ji ber dirundetiya hukumdarî ya bê qam  
û

bê sinûr. Û ji ber wan sedeman, wî nûkirina berxwedana çekdar, ji  
bo rê-

girtinê li ber zordarî û zordariya wî, bi tiştê herî giring, bi kêmanî di  
wê

qonaxê de, didît.

Şêroyî ew lênerîn û baweriya xwe ji wan hevalan re diyar kir. Piştî  
bi-

hîstina wan hevalan bo raya Şêroyî, Dildarî ev pirsyar jê kir:

62 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Tu dibêjî em bikaribin tişteki bikin? Ew Barzaniyê mezin, bi wê

hemû kenkene û zîrekî û hêz û şîyan û şehrezahiya xwe neşîya vê  
hukumetê jinav bibe, evca tu bawer dikî ko em, ev çar kese bikaribin  
dest

bi serhildaneka nû ya çekdar bikin?

— Xwe, dê her yek yan çend kes dest pê bikin, û çima em ew kes  
nebin?

Şêroyî bi zimanê kesekê pir bawerî bi xwe heyî bersiv da. Mebesta  
min jî

ne kêmkirine ji buhadariya Barzanî, nexêr, hindî ji dest wî hatî, wî li  
gor

zanîn û pêçêbûnên xwe xizmeta milletê xwe û serxwebûna wî kiriye  
û ew

di dîroka me de dê bi qomandarekê neteweyî û millî hête  
navlêkirin. Bes

digel vê jî, divêt em jibîr nekin ko yê giring di pirsê de millet e û kesên  
we-

ha weko Barzanî bê milletên xwe peyda nabin. Millet e, Barzanî û  
serok û

rêberên mîna wî tîne pêş yan nizim dike. Millet jî namirin û hindî  
koletî

û zordarî û dagîrkirin di welatê me de hebe dê berxwedan û raperîn  
û

şoreş jî hebin.

— Şêro, birawo! Ez di zimanê fermesonan nagehim, evca ya di dilê  
xwe

de bi zimanê me gundiyan bêje, Bawerî bi serxurandinê re ev got.

— Hûn, min çewt fêm nekin. Min ne li ber e, em çi partiyan çê bikin



û daxwaza min ew nîne ko rojekê ji rojan bibime serkêş û mezinek,  
Şêroyî

armanca xwe şirove kir. Mebesta min ew e em tiştêkê weha bikin  
ko

hukumet pê bitirse û bizanibe ko ev kiryarên wê dê bibin egera  
şoreşeka

din û belkî bi wî awayî em bikaribin tuxîban ji zordariya wê re  
dabinin.

Her wisa belkî xwefiroş û xinizkar bitirsin û dev ji wan karên xwe  
yên çe-

pel berbidin. Ê ji wan re xuya bibe ko kiryarên ji wî rengî bê sizaya  
miletî

derbas nabin.

— Ew çi pêşmergetî ye em dê bê çek bikin? careka din Bêwarî  
gumana

xwe bi ziman xist.

— Em, di dsetpêkê de, dê bi çeqokekê biçin telba serbazekî û dê  
tiven-

ga wî ji xwe re hilgirin, Segvanî li batî Şêroyî bersiv da. Paşî em dê bi  
wê

tivengê û çeqokine din serbazine din jî ji çek bikin û tivengên wan ji  
xwe

re rabikin û weha leşkerê pêşmergeyan çê dibe û ew bi çek dikevin.

— Ya çekî, eger rast be û çi kesek berî me bi ser nehilbûye, ez  
dikarim

bibêjim ko me têra xwe û bêtir jî heye, Şêroyî ev nihînî havêt ber  
guhên

wan.

Wê nûçeya Şêroyî, ya ko ji nişkan ve bi ber guhên wan keftî, ew mende-

hoş kirin û dev li wan beş kirin û bi hêbetbûn wan ve li hevudu nihêrî.

Şêroyî çîroka çekê di goristanê de vaşartî û Ezîzê Siloyî ji wan re vegêra. Ji

wan re bû mereqeka mezin ko rastiya wî çekî bizanin. Wan her çwaran,

63

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

her wê rojê bi şev, du tevir û du mer bi dest xwe xistin û ber bi başûrê we-

latî, ber bi wê goristana çek tê de veşartî da rê.

64 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—8—

Katjimêr, dema gehiştin bo nav goristanê, nêzîkî dwanzdeyî nîvro bûbû.

Ew, di goristanê de, li wan pênc goran geriyan. Piştî bîstekê Dildar bi ser

darekê hilbû ko di nîva goristanê de bû û bi pênc goran dormandor kirîbû. Ew rawestiya û piştî ko ji hejmartina gorên li rex û rûyên wê darê

piştrastbûyî ko pênc in, wî bangî hevalên xwe kir û got:

— Heke ew çîrok rast be, ez dibêjim eve ew dar û ew gor, lê ya çekî qet

nakeve serê min ko tê de be.

Her di wê gavê de, her sê biraderên din jî li cem wî amadebûn û Şêroyî

tevrê di destê xwe de bilind kir û got:

— Ma ev tevir û ev mer bo çi ne? Nê ew bo hindê ne ko em pê bizanin

ka rast, di zikê van goran de çek heye yan na, û wî digel timamkirina axiftina xwe, tevrê xwe dawêşande gorekî û dest bi kolanê kir.

— Ez bi xwe na kolim, Bêwarî biryara xwe xiste ber havalan. Pa heke derkeft direw û li şûna çekî û tivengan hestiyên miriyan ketin ber devên

tevir û merên me?

— Hîngê, em dê axê radin ve ser qebran û ji bona ko em tivengan bi

dest xwe bixin dê dest bi metoda min bikin, weha Segvanî rê li ber gu-

manên Bêwarî girt. Niha, werin da em dest bidin kolanê û bizanibin ka

çend rastî di serpêhatiya Ezîzê Siloyî de ye.

— Lê divê haya me ji me hebe û kesek ji van gundan bi ser me hil nebe,

heke dê fermana me rakin û dê pilana me jî ji bin biçê, Şêroyî xwest ko

hevalan ageh ji xwe hebe. Lewma ez dibêjim ya çêtir ew e kesek ji me li

hindav rêkê be û me li ser hatina her kesekî agadar bike û ez dibêjim bila

Bêwar bi wî karî rabibe, xwe ew her gora na hilkole.

Hosa wan dest bi hilkolandina goran kir. Di destpêkê de axa req kete

ber tevrên wan û paşî ya piloxe. Piştî çend deqîqeyekan Segvanî bi ser-

sorman ve kir gazî:

— Kuro! her weçku tişteke req di vî gorî de ye!

— Bêguman di her gorekî de tişteke heye, Dildarî got. Pa hestiyên miriyan li kîderê ne, eger ne di goran de bin?

65

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Hersê keftin ber ji axê kişandina wî tiştê ko destpêkirî xuya dibe.

Naylonêkê stûr hate nav destên wan, lê neşiyar wî bi hemû ve û bi hêsanî

ji gorî derbixin. Wan gor pîçeka din jî hilkoland û ax ji ser veda û wan hersiyar, bi hemû hêza xwe, ew naylon kişand û anî derê. Tiştine sengîn

tê de bûn, vedikin, dibînin ko çek di hundurî de ne. Klaşînkof baş bi nay-

lonî hatibûn werpêçan, bona ko ter û jengî nebin. Wan ji çavên xwe baw-

er nekir. Mereqa wan kete ser gorên din ka çi texlîta çekê tê de ye.

Bi lez

û bez û her wesa herçiwar gorên din jî hilkolan û çekên di wan de jî danîn

ber xwe. Heft tivengên klaşînkof û tijî wê derê sacor û gulleyên wan û du

arpîçî û çend gulleyên wan di wan pênc goran de bûn.

Şêroyî bangî Bêwarî kir û wan bi hev re biryara xwe da ko hemû çekî  
bi  
xwe re bibin û hêj nebûye spêde xwe bigehênin ser sinûran digel  
bakurê  
welatî. Ê li wê derê û piştî ko baş bêhna xwe vedidin, li ser pilana  
kar û  
xebata xwe ya paşerojê rabiwestin.  
Ew nêzîkî tuxîban bûbûn dema tîrêja tava berê spêdeyê taryatiya  
şevê  
dişikand û bera wê dida û germatiya xwe dida çiya û zozanan. Şêroyî  
çay-  
dankê çayê tijî av kir, kuçkek çêkir û agir tê de hilkir û çaydankê xwe  
danî  
ser. Hersê hevalên din jî raketin û xwe berdan nav xewê. Şêroyî  
hinek ji  
tovê çayê berda nav wê ava di çaydankê de dikeliya û çaydank deyna  
rex-  
ekî, nêzêkî pelên sor bona ko ça bi dilê xwe dem bigire. Çendek pêve  
çû,  
ça çêbû, Şêroyî kopikê xwe ji çantikê anî derê û ji xwe re çayek têkir  
û dest  
pê kir bi germî vexwar, bi armanca belkî pê bikaribe xewê ji çavên  
xwe ve-  
birevîne. Segvan, di wan gavan de hişyarbû. Wî serê xwe rakir û  
gote  
Şêroyî:  
— Pismam, manê me li bere em pêşmergetiyê bikin û heke pêşmer-  
getiya rast be niha nobeya te bi dawî hat û ger gera min e.

— Te ya rast bivêt, xew wenake mijulankên çavên min jêk vebibin,  
Şêroyî diyar kir ko dixwaze binive. Divêt em bi roj têr binivin bona  
ko

em bikaribin bi şev têr bilivin û di bizavê de bin.

Şêro jî bi rex hevalên raketî raza û xwe da dest xewê û xweşî û  
hînkatiya

wê zozanê. Wan ji xwe re cihekê veder ji rê û nepenî , cihekê bilind  
ko çi

kesek zû û bi hêsanî bi ser wan hilnebe, hilbijartibû. Lê digel hindê  
jî, bi

nobet, yek li pey yekî zêrevanî û çavdêrî li hevalên nivistî û dewr û  
berên

xwe dikir. Bûbû piştî nîvro dema Bêwarî hemû ji xew rakirin û  
gazîkirin

bo ser têştixwarinê. Şêroyî şeker xiste nav çaya xwe û di ber  
têkvedana çayê

re got:

— Birano! Niha me çekê xwe heye û em dikarin pê bizavine wilo  
bikin,

66 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

pê ji hukumetê re biselmînin ko eger şoreşê şikestin xwaribe, millet  
heye

û namire û weha berxwedan berdewam e. Divêt em vê hukumetê  
têbige-

hînin ko hindî millet di bin bindestî û zordariyê de be dê pêşmerge  
û şoreş

û serhildan jî her hebin. Divêt em tiştine weha bikin ko mirovê kurd  
pê  
biveciniqe û êdî hizrê neke ko ev dawiya kurda ye û herweha bibe  
egera  
ko ew dev ji koşa dagîrker û cehîşkatiyê berdin. Bes tiştê herî giring  
ew e  
em çi tiştê weha nekin, zerera xelkê me jê çê bibe û em tadariyê li  
çi ke-  
sekî jî nekin. Kurt û kurmanc em weha bikin ko ew zordarî û tadarî  
û  
destdirêjkariya li milletê me tê kirin nemîne û neyê kirin.  
— Lê, ma dê em çiwar kes bi tenê çi bikin? Bêwarî axiftin lê birî û  
pirsyara xwe xiste ber hevalan. Dê baweriya kê bi çwar  
pêşmergeyan hêt?  
Dibêjin dê partî dest bi şoreşê bike ve, heke wesa be, hema da em  
xwe lê  
bigirin û bi wan re dest pê bikin.  
— Bêwar, heke dê ji destpêkê ho yê sar û bê bawerî bi xwe û xelkê  
xwe  
bî ya çêtir ew e tu biçî rûnî ber teniştê hurmetekê û ji xwe re  
zarokan çê  
bikî, Segvanî bi dengekê dijwar bersiva wî da.  
— Ma kî digel te axiftiye? Bêwar ji wî çeşnê bersivdanê torebû û  
çavên  
xwe li Segvanî girê kirin. Paşî ma tu axînkên bo himbêzên xweşên  
jinekê  
ranahêlî, yan tu ji esmanan hatiye xwarê? Belkî jî tu bê ew tişt bî!

— Hey mala we doşav tê bizêt, ma eve çaxê hevrikanê û cirenîxa ye!  
Şêroyî zû axiftina xwe avêt û rê li ber berdevdana Segvanî girt û xwest  
dawiyê bi wê cirreyê bîne. Hevalên hêja! Min nevêt xwe bi serê ti kesekî  
de bikim zana û şehreza, lê ez dixwazim tiştêkî bêjim; eger em dê bi he-  
vudu re kar bikin, divêt em dilên xwe ji yek û du re vebikin û rêzdariya  
me bo lênerîn û dîtinên me yên cuda cuda hebe, hemû ji bona ko em di  
karê xwe yê hevbeş de serkeftî bin. Birayê Bêwar, ya partiyê ko dê dest bi  
şoreşê bike heta niha haya min jê nîne û eger hat û bû rastî hîngê her ke-  
sek yê bi dilê xwe ye û her ji destpêkê min gotibû ko mebesta min ji vî karî  
ne ew e em partiyekê dabinin. Çunkî hindî ez im , ez di xwe de, wê şiyar  
û zanîna birêvebirina partiyekê û şoreşekê nabînim. Pismam! em qala  
nûke dikin û ka subehî kî tê qadê û ka kî ji me diçe digel û kî naçe, ew  
pirseka girêdayî her kesekî ji me bi serê xwe ye. Segvanî rast got, ko divêt  
berî her tiştî mirovî bawerî bi xwe û bi milletê xwe hebe. Her weha Bêwar,



te jî rast got, ko çî leşker ji çîwar kesan bi tena serê xwe pêknayên.

Lê rê

heye ko kesine din jî bigehin me, her çend e nebaş e hejmara me

boş bibe,

ji ber ko şerê me dê yê partîzaniyê be, ne şerê berok û eniyan be.

Armanca

me ew e em dirbên xwe bi dizîkî ve li dagîrker û zordaran biweşînin

û xwe

67

### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ji ber çavên wan wunda bikin û bi hîç rengê -kêm tişt di qonaxa niha

de- em nebin xwedî bingehên destnîşankirî û akincî. Bawer bikin

gelî

hevalan, ez, di nava xwe de, xwe bi sextirîn dijminê çek û cebilxane

û şer

û kuştinan dibînim û hêvîdar im ko pêwîstiya me bi çî kuştinkariyan

nebe, lê ez hindî hizra xwe dikim ko çareyeka din ji rewşa me re

peyda

bikim, ez nikarim û ev çare bi tenê di ser û mejiyê min de heye. Ma

da çî

ji hindê çêtir be ko pirsarî me bê şer û xwîn hatiba çareserkirin,

lê

Xudê mala bêbext û dilpîsan bişewitîne ko em tûşî rêyeka weha

kirine.

Şeroyî lê nihêrî ko Bêwar bê deng û mit bûye, mîna kesekê li gotina

xwe

peşîman, evca wî dest pê kir pilana bizavên xwe bo şeva dihêt berçavî

hevalan kir û gêngaşe li ser çêbû.

Pêşniyar û dîtînên cuda yên her yekî ji wan hebûn û di dûmahiyê de biryar hate standin ko Şêro bibe rêberê wan. Şêroyî xwest xwe ji rêbertiyê

bide paş û hevalekê din bi wî karî rabibe, lê hersêyên din ji gotina xwe ne-

hatin xwarê û weha Şêro bû berpirsyarê grupê.

Weku şeva bihurî, lê wê carê çek bi milan ve, ew ketin nav devera Berwarî Bala û çûn gundê (B). Berî ko ew biçin bo nav gundî Şêroyî gote

hevalan:

— Hûn çî neaxivin, dê ez bi tenê axivim. Dema hûn bangî hevudu dikin, peyva heval bikarbînin. Eger kesekî ji we rexneyek li ser hevalekê

xwe hebe, di nav xelkî de wê rexneyê nekin û bihêlin bo piştî derketina

me ji gundî. Eger hûn neçarbûn ko bi kesekî re biaxivin, bila zimanê we

ji gundiyan re zimanê rêzdarî û hurmetgirtinê be.

Çaxê ew ketine nav gundî, gundî têkhatin û têkçûn û bû pis pisa wan û got gotik weko biruskê di nav gundî de geriyan:

— Kuro! eve pêşmerge ne, pêşmerge hatin ve.

— Diyar e şoreşê dest pê kir ve.

— Hema weko caran nebe û karesateka din li pey nebe, baş e.

— Her weçku ew ber bi mala kwîxweyî ve diçin.

— Erê gelo ma kî nabêje ew ne sîxurên hukumeta Iraqê ne û bi kinc  
û

cilên pêşmergeyan hatine gundan.

— Ew jî dibe. Dibe ko ew bi vî rengî dixwazin xelkê ko li dijî wan be,  
nas bikin.

— Hey pa xişîm in, ma hukumet nizane ko em van çel û çiyayên xwe  
nadin bi Bexda û taca wan.

— Pêşmerge ji ko ve, ew roj çû nahête ve û Barzanî yek bû, çû û ran-  
abite ve

## 68 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Babo ez bi Xwedê kim eve pêşmerge ne. Hema ji navçav û  
rêveçûn

û karê wan xuya ye.

Deriyê mala kwîxweyî hate qutan. Kurê kwîxweyî dergeh vekir,  
dema

çavên wî bi çavên pêşmergeyan keftin, ew di cih de ma neliv û  
çirrîseyê

xwe li serê wî da û nezanî çi bike, lerizî û bê ko peyvek bi tenê jî ji  
devê wî

derbikeve, ew bi bez vegeriya bo hundurê xanî. Dêm lê zerspîtale  
bûbû û

bêhin lê kurt bûbû û bi ezmanekê tirtirî gote babê xwe:

— Bab....bab, pêş...pêşmerge li ber derê mala me ne.

— Çi ?! Eve tu çi dibêjî, babê bi sexerkbirin ve bersiva kurê xwe da  
û pit

pitek bi dengekê bilind ji ber lêvên wî derdikeft. Diyar e ev kurê min  
dîn-

bûye. Ma tovê pêşmergeyan jî ma ye? Ma kesek diwêre bibe  
pêşmerge û

li van deran serê xwe diyar bike? Ma her kesekê kincên kurdî li ber  
bin

pêşmerge ye? Ev kure dê...

Dema kwîxweyî der vekirî, gotin di gewriya wî de xendiqî û çav lê  
boq

bûn. Şêro, ko li ber derî bû, haya wî ji wê axiftina kwîxweyî hebû, wî  
di-

gel dervekirinê gote kwîxweyî:

— Belê kwîxwe, em pêşmerge nin û ha tu bi çavên serê xwe dibînî  
û em

bisteh dikin bêne vê derê û em dê subehî xwe li Bexdayê jî bidin.

Guhên

xwe baş veke, em bi lez in, me hevalên xwe li danga gundî hiştine û  
me ji

vî gundî xwarin têra şiv û têştî xwe divêt.

— Belê...belê ezbenî, bi dengê tirs tê de xuya kwîxweyî got. De  
bila

pêşmerge kerem bikin û bêne gundî, da ko ez wan li ser malan belav  
bikim.

— Yek em bi lez in, Şêroyî bi zimanekê pir xweş û bawerî bi xwe heyî  
welama wî da. Du, em 150 kes in û fermanên me ew in ko em bi  
hejmarên

mezin nekevin nav gundan, evca lezê bike û xwarineka sivik, ya  
serpê ji

me re ber dest bike.

Ji kwîxweyî re, dîtina pêşmergeyan û ho ji nişkan ve û bihîstina wê hej-

mara mezin ya wan, weko aveka pir sar bû ko di zivistaneka qerimî de bi

ser serê wî de rijiya. Pêşmerge li ber derî hiştin û çû hundurê xanî û zû bi

kurê xwe re zivirî û telêsekê sipî û mezin yê şûna şekirê di dest kurê wî de

û herdu ketine nava gundî, ji malekê bo ya din, ji pêşmergeyan re nan û

xwarin da hev. Kwîxweyî digel xwe digot:

— Ne herê, careka din pêşmerge peydabûn ve û ew dê nanê min qut

bikin. Ya çêtir ew e û hê ez li çî belaya nedayîm, ez dev ji kwîxwetiye berbidim. Bes hema vê carê çî li min nekin...

Kwîxwe û kurê xwe piştî nîv seetê hatine ve û telîsê wan bi lêvan re tijî

69

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

xwarinên cur bi cur yêni hişk bû û wan ew telîs da dest Şêroyî. Segvanî û

Dildarî dest dan telîsî, ji Şêroyî wergirt û bi hev re xatra xwe ji kwîxweyî

û ji gundiyên li nêzîk xirvebûyîn xwest û da rê.

Çend pêngavekan çûn, Şêro li pişt xwe zivirî û berê xwe da kwîxweyê

ko hêj li ber derê mala xwe rawestayî bû û gotê:

— Kwîxwe, çavê te li gundiyan be û xizmeta wan bi başî bike û pişta wan bigire. Em dê yekudu bibînin ve.

Piştî ko ew ji gundî derkeftin, Segvanî pirsyar ji Şêroyî kir:

— Ew çî sed û pêncih pêşmerge nin û ev hemû xwarine bo kê ye?

— Manê eve ye karê me yê îşev, Şêroyî bi bişkurîn li hersê hevalan ni-

hêrî û bersiva xwe bi kurtî da.

— Ez ténagehim ka te bo çî em çîwar kirin 150 û te ev hemû xwarine ji

gundiya stand? Bêwarî bi bêhin tengî pirsyar havête ber Şêroyî.

— Her roj spêdeyê kwîxweyên hemû gundan diçin nahiyê û ew her çî

tiştê, çî hûr û çî gir be, ko di gundî de biqewime digehînin dam û dezge-

hên hukumetê. Çîwar pêşmerge bi tenê hukumetê natirsînin û nahe-

jînin. Lê nûçeya hebûna 150 pêşmergeyan di deverê de, dê plan û nexşeyên hukumetê tevlihev bike û têk û pêk bide. Ya nanî jî, bona ko

hemû gund pê bizanibe û kwîxwe û hukumet pê bawer bikin ko 150 pêşmerge hatine vî gundî. Niha rawestin da her yek ji me têra xwe nanî û

xwarinê dake çantika xwe û ya dimîne jî dê em di rêya xwe de berdî nav

rûbarî, bila masî jî bi xêra wê derewê têr bixwin. Divêt îşev şeper bi me ve

bin û em vê bi serê çend kwîxweyekên dî jî bînin. Em dê niha xwe

gehînin gundekî li devera Zaxo û paşî em dê hêneve gundekê vê  
deverê û

em dê bi vî awayî serên rêya li ber hukumetê berze bikin û wesa  
nikare

rastiyê ji derewê vavêr bike. Xwe, subehî ne dûr e û dê em zanin ka  
çawa

me bi kiryareka weha hukumet aniye îşte îştê û dê em sube bi çavên  
xwe

helîkopter û semtiyên wan bînin ka dê çawa heta êvareka dereng  
bi ser

deverê de hên û çin.

— Ji gotina te diyar e ko em subehî dê li van deran bin! Segvanî bi  
vê

gotina xwe axiftin li Şêroyî birî.

— Çima na, em dikarin xwe di kiloxekê çiyayekê asê de mit bikin û  
temaşayî rewşê bikin ka dê çibe û dê çawa be, Şêro ji van axiftinên  
xwe bi

bawer bû, te digot qey wî deh pazde salan pêşmergetî kiriye. Lê ez  
dibêjim ya çêtir ew e em subehî li cihekî bin ko ji vê derê dûr be,  
bona ko

em çend tevgerekan lê bikin.

— Baş e, hûn bo çiyayê Gareyî çi dibêjin bona ko em subehî digel

70 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

berbangê xwe bigehîninê û roja xwe ya sube tê de derbas bikin?  
Bêwarî ev

pêşniyaz xiste ber hevalan.

— Gelek baş e û çi cih ji wê derê çêtir nînin û em dikarin duzbe ji wê

derê biçin bo nav Nêrweyan, Şêroyî got.

Hosa û piştî ko her di eynî şevê de ew çûne du gundan, yekî li devera Zaxo û yê din li devera Berwarî Bala, wan digel elindê xwe gihande Gareyî. Wê spêdeya ew gehiştine Gareyî, kwîxweyên wan gundên ko ew

bi şev lê bûbûn mêvan ber bi nahiyê çûn. Her kwîxweyekî bûyer bi awayekî berçavî berpirsyarên hukümetê kir:

— 150 pêşmerge bûn û çekekê baş di dest wan de bû.

— 210 pêşmerge bûn. Heta me xwarin jî da wan. Ez dibêjim ber bi de-

vera Duhokê diçûn û wan digot ko pêşmergeyan dest pê kiriye ve.

— 45 pêşmerge bûn û wan digot li her deverê çend sed pêşmerge hene.

— Ne bes klaşînkof pê re bûn, lê arpîçî û dûrbîn û tiştine din jî.

Wan deng û basên hungurê spêdeyê hukümet anî îşte îştê û şilqek pêx-

ist. Danûstandin bi Bexdayê re hatine kirin û Bexda xeyidî û gef li berpirsyarên hukümetê li deverê kirin, eger ew bi zûtirîn wext wan pêşmergeyan jinav nebin û wê »pîlana împeryalîzma cîhanî û siyonîzmê

bo ser elweten el'erebî têknedin''.

Ji tirsê Bexdayê desthilatdarên lokal ferman dan û helîkopter û semtiyan ji nişkann ve esmanê devera Berwarî Bala û Zaxo dagîr kir û

heta êvareka dereng ew li pey wan pêşmergeyan geriyan û çî pêşmerge bi

dest wan nekeftin. Roja din gera Gareyî û ya paştir li devera Nêrweyan û



di hemû rojan de, êvarê leşkerê hukümetê tirsîyayî, mandîbûyê û weko dibêjin dest ji pêyan dirêjtir vedigeriya ve bo bingehên xwe û serbazan digotîne hevudu »lo ev pêşmerge mîna ercîna nin, mirov nikare wana bi çavên xwe bibîne û ew li hemû cih û deran in«

Li gor gotinên kwîxweyan, Bexda ji karê efser û berpirsyarên deverê ne razî bû, lewma jî wê her zû gelek ji wana guhertin û ji yên nû xwest ko ew bi lez û bez pêşmergeyan û navê pêşmergetiyê bi yekcarî binbir bikin û heke weha nekin dê çarenivîsa wan jî weko ya yên berî wan be. Karê her çwar hevalan di mehekê de bû ew û wê tevgera wan kartêkiri-na xwe hebû. Rûniştivanên deverê bawer kir ko pêşmerge hatine ve û yê xwe bi ser û ber dikin û dê di wan nêzîkan de dest bidin dirbweşandinê li bingehên hukümetê û leşkerê Iraqê li deverê, dê dersan bidin dûvelankên hukümetê û caş û xinizkaran. Hukümet jî weke kunemêşa zilkêtkên

71

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

azirî, di nav xwe de dihat û diçû, dixwest bizanibe ka ew pêşmerge kî ne,

ser bi çî partî ne û xwe li kûderê vedişêrin, lê nikaribû rastiya wan bizanibe.

Di wan hatin û çûnên wan de gihşte guhên wan ko çeperê serbazên

Iraqê li Serê Hemê li devera Berwarî Bala, bûye astengek di rêka rêving û

karwançî û xwecihên deverê de. Ta şivan jî ji gullebarankirin û tadarîyên wan rizgar nabin û xelkê sivîlê wê derê ji ber wan serbazan çî

rehetiyek nîne. Evca her çwar hevalan biryar da çareyekê li wî çeperî

bikin; kêmtîşt weha bikin ko serbaz bitirsin û êdî bîsteh nekin xwe talo-

qetî xelkê deverê û hatin û çûnên wan bikin.

Wan xwest zanyariyan li ser wî çeperî bistînin û xelkê gundên nêzîkî wî

çeperî, di wî warî de, ji wan re pir arîkar bûn û hêviya wan ew bû ko ew

pêşmerge çareyekê li wî çeperî bikin û bela wan serbazan jê vebikin. Li

gor wan zanyariyan, goya 30 serbaz di çeperî de ne û bijlî tiveng û narin-

cokan doşkeka wan jî heye.

Berî çend rojekan wan serbazan bêrî gullebaran kirin. Xecoka Ahmedê

Qumrî û zarokê wê yê yeksalî ko di parzînê wê de, li piştta wê bû, bûn ar-

manca wan gulleyan û derhal hatine kuştin. Ewê bûyerê xwecihên  
wan  
gundan û bi taybetî ew her çwar heval gelek bi xemxistin û ew  
handan ko  
biryara xwe zû bicîbînin.  
— Berî em dest bi kiryareka weha bikin divêt em, berî her tiştî,  
mirina  
xwe deynin ber çavên xwe, Segvanî got. Bes pêwîst e jî, em li ser  
xwe bin  
û bi haybûn ji xwe vî karî bikin.  
— Hey, paşî ma ya ji te ve qey ew her 30 serbaz bi şev û roj di çekên  
xwe  
de nin û di nobedariyeka berdewam de ne! Bêwarî bi zimanekê  
pêtrankî  
li ber devê Segvanî da. Bira, bawer bikin, bi şev, du yan sê  
nobedariyê  
dikin û yên din hemû dinivin. Evca hema em bes wan nobedara  
bêhiş  
bikin, dê çeper hemû di dest me de be.  
— Birano çî dibe bila bibe, divêt em êrişekê bibin ser wan û dersekê  
bidin wan, Segvanî dixwest axiftinê li ser vî babetî kurt bike. Heta  
dîfin li  
wan neyê herişandin ew dev ji wan kiryarên xwe yên çivêl bernadin.  
Bes,  
berî ko em êrişê bikin divêt em çend rojekan ji dûr ve, çî bi  
berêxwedana  
senta çavan û çî bi dûrbînan, zêravaniyê li wî çeperî û hatin û çûna  
wan

serbazan û rêyên çeperî bikin, bona ko em bi çavkorehî neçin ser wan.

Wan, piştî sê rojên kontrolkirina çeperî û serbazên tê de û rêyên hatin

û çûnên wan, pilana xwe danî. Demjimêr dwanzdeyî şevê bû, dema her

çwar gihaştin bin dîwarkê çeperî. Şêroyî serê xwe bilind kir û çerxek li dor

## 72 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

çeperî da, jê re xuya bû ko bes du serbaz bi tenê di nobedariyê de ne.

Herdu serbaz nêzîkî hevudu rawestiyabûn û bi hev re dipeyvîn û çike-

sekê din ji bilî wan xuya nebû. Şêroyî mêzekirê, her yek ji wan serbazan

ber bi aliyekê çeperî kete piyaseyeka hêdî hêdî. Yekî, radyo pê re bû û ber

bi rexê piştê çû û yê din ber bi deriyê çeperî hat. Şêroyî nîşanek da hevalan

bona ko Segvan û Bêwar biçin telba yê piştê û Dildar digel wî êrişî yê

nêzîkî derî bikin.

Şêroyî kevirek rakir û avêt û hêl li pêpikên ber derî da, dengê pêkeftina

berî çû serbazî. Wî xwest bizanibe ka ew çî ye, serê xwe ji deriyê çeperî anî

der û nişîv kire xwarê bo ser pêpikan, lê wî çi nedît, evca ew  
vegeriya bo  
ser piyaseya xwe ber bi serbazê din, xuya bû ko tirsiyabû, lewma  
qesta  
hevalê xwe kir. Lê dengê berê duyemîn yê Şêroyî, ew serbaz xiste  
gumanê.  
Wî klaşînkofa xwe ji milê xwe vekir û xiste di nav lepên xwe de û li  
dor  
xwe zivirî, çi nedît, evca pêyekê xwe bir bo ser pêpikan û hê pêyê  
duyê ne-  
havêtî xwarê, Şêro ji wî siviktir bû û ew pêyê wî yê yekem girt û hêl  
ji ber  
wî rakêşa û serbaz dev û dev li binê derecikan da. Her zû Şêroyî  
tivenga  
xwe bilind kir û qontaxa wê li patika serbazî da, yê ko hewil dida  
serê xwe  
bilind bike û wî ew serbaz demildest bêhiş û teraşî wê derê kir. Zû  
Dildarî  
rahişte tivenga serbazî û da dû Şêroyî bo nav çeperî.  
Hindî Segvan bû, serê xwe bi ser dîwarê çeperî re bilind kir bona ko  
xwe hilbide silal bo aliyê çeperî yê ji nav de. Serbazê radyo di dest  
de hest  
bi tişteki kir. Yekser radyoya xwe vemirand, li rex û dorên xwe  
nihêrî, çi  
nedît, du sê carekan bi dengê nizim gazî hevalê xwe kir  
„Hemze....lek  
Hemze....Hemze..” Segvanî, ko guh li dengê gaziya wî bû, serê xwe  
niz-

im kir ve û xwe da ber dîwarkê çeperî, bi rex Bêwarî ve. Serbaz ber  
bi wî  
rexê dîwarkî yê ko Segvan û Bêwar li piş çû, lê hê negihaştîyê û ji  
pişt ve  
pêjneka pêyan hatê. Bê ko li pişt xwe bizivire, ya ji wî ve ew hevalê  
wî ye,  
li pey gaziya wî hatiye, lewma got »haze inte Hemze'', lê çî kesekî  
bersiva  
wî neda, evca xwest li pişt xwe bizivire û bizane ka ew çî pêjn e ho  
nêzîkî  
wî dibe, lê hê baş serê xwe ne zivirandî paş, qontaxa tivenga Şêroyî  
bi  
hemû hêza destên Şêroyî hat û bi zîkê serbazî keft û ew xiste erdî û  
tiveng  
ji destan veresande dûrî wî. Ji çavzilkanekê zûtir Bêwarî xwe ji ser  
wî  
dêwarkî havête aliyê ji nav de û xwe zû havête ser serbazî û dev lê  
girt.  
Dildar û Segvan çûn û serbazê dî yê li ber derecikan keftî anîn û dev  
li  
herduyan girtin û ew herdu, bi şelîtekê, pêkve girêdan û şelît xiste  
ke-  
virekê mezin ko di dîwarî de bû bona ko nikaribin xwe ji cih bilivînin.  
Wan zû çavek di dewr û berên odayê de gêrand, lê, wan ji bilî wan  
her-

73

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

duwan çî kesekê din nedît. Ew ji hindê pişt rast man ko yên mayî di odayê de raketîn e. Dergehê jorê ji darî bû û pêvedayî bû , lê ne daxistî bû.

Şêroyî wenekir ko heval biçin bo nav hundurê odayê û wî hizreka din

hebû û wî tişteke gote Segvanî.

Segvanî li gor gotina Şêroyî kir û xwe zû havête pişt doşkê û berê wê da

mezelka serbaz tê de nivistî û seliyeka wê bi ser mezlekê ve berda.

Şêroyî

û hevalên din cihên xwe li ber herdu aliyên derî kirin û berê tivengên xwe

dane derî. Bi erebî û bi dengê xurt û bilind Şêroyî bangî wan serbazên

di hundur de kir:

— Em pêşmerge nin û me rex û dorên we girtine. Evca heke we divêt

hûn neyên kuştin, çekên xwe di hundurê odayê de bihêlin û bê çek û dest

bilindkirî, yek li pey yekî derbikevin.

Çî bersiv ji hêla serbazan ve, ji hundurê jorê nehatin, lê ji wê qerebalixa

wan xuya bû ko ew li ber xwe keftine û nizanin ka çî bikin, çî nekin.

Lewma Şêroyî careka din û bi dengê bilindtir û tingijîtir gazîkire wan:

— Em bo cara dûmahiyê we haydar dikin. Divêt hûn zû ji odayê derbikevin. Ez dê ji 1 heta 10 bijmêrim û eger hûn piştî hejmara dehê dernekevin, wê gavê guneha we di stuyê we de û xatra xwe ji jiyânê

bixwazin. Çunkî heke hûn guh nedin me û piştî timam bûna hejmartinê

zû dernekevin dê ev odeya hûn tê de bi we ve hête peqandin. Dema hûn

derdikevin jî çî çivêliya nekin çunkî berê doşkê li derî ye û tivengên pêşmergeyan jî arasteyê der û dorên odayê kirîne. Ez niha dest bi hej-

martinê dikim.

Şêroyî dest bi hejmartinê kir û Segvanî xwe li pişt doşkê peyt kir û hevalên din jî di cihên xwe de peyt û amadebûn. Hêj Şêroyî negotî neh,

deng ji derî hat, vebû û patekê sipî xuyabû, diyar bû fanêleyê serbazekî

bû. Serbaz jî, weko Şêroyî jê xwestî, bi destên vala û bilindkirî û yek li pey

yekî derkeftin. Dildarî, her di cih de û zû, sehûsiya her serbazekî dikir

nekû çek pê re be û serbazê ko wî berdida Bêwarî digirt û neçar dikir ko

rabikeve erdê ser zikê xwe, navçav li ser axê û herdu dest li pişt patikê.

Weha bûn 29 serbaz û digel herduyên pêşiyê hejmara wan bû 31 kes.

Şêroyî ferman da Bêwarî û Dildarî bona ko biçin wan herdu serbazên din

jî bînin cem wan. Dema ew gehiştine nik wan serbazan, hê ew li cihê xwe



bûn û bê deng, lê li dema Dildarî xwestî şelîtê vebike bona ko bikaribe

wan bi pêyan, ne bi raxîşandinê bibe, ji nişkan ve yê milê çepê pehînek li

navçavên Diladrî da û ew pişt û pişt rahavêt. Xuyabû ko şelît baş nehati-

bû girêdan û wan vekiribû û di wan gavên ko wan şelît tê de vekirî Dildar

#### 74 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

û Bêwar gehîştin cem wan.

Hê yê milê rastê xwe ne livandî Bêwarî pehînek li devî da û zû lûliya tivenga xwe raheşande nav devê serbazê milê çepê yê ko pêhin li Dildarî

dayî. Zû Dildar rabû ser xwe û hate hindav wî yê ew dirb daniyê û bi xeyidîn berêxwedayê; li ber tava heyvê dêmekî 19- 20 salî yê başûrê Iraqê,

dibe ko ji Besrayê bû, hate ber çavên wî. Di wê gavê de dengê Şêroyî hate

wan, ji wan dixwest ko lezê bikin. Bêwarî tiveng ji devê serbazî anî derê û

lê heyitî û ew û serbazê din yê ko ji tirsan dilerizî dane pêş xwe û ew gi-

handine nik yên din.

Sê ristikên cil û kinchilawîstinê bi dîwarê mezelkê û dîwarê çeperî ve

girêdayî bûn. Şêro giha ristika û çeqoka xwe ji berîka şelê xwe anî derê û

ristik jê vekirin. Wî serbazên li ser erdê kirin du rêz û wî û Bêwarî pê  
û  
destên wan bi hev re girêdan û vê carê mukum ko nikaribin xwe bi  
hêsanî  
jê qurtal bikin. Segvan ma li ser doşkê û berê doşkê jî li serbazên  
dest û pê  
lê girêdayî û li ser zikê rakeftî û hersê hevalên wî yên din çûn bo nav  
hun-  
durê odayê. Tiveng û narincok û gulle û du dezgehên biçûk yên  
bêtel yên  
ber dest anîn derê.  
Şêroyî ji Dildarî û Bêwarî xwest ko li dewr û berên çeperî li dewarên  
serbazan bigerhin û wan bînin bona ko ew çekî pê bar bikin û bibin.  
Çi  
pê neçû, herdu û serhefsarên du hêstiran di destên wan de  
vegeriyan.  
Wan, ew herdu hêstir ji çekan bar kirin û Şêroyî kincine nû yên  
serbazan  
ko di odayê de bûn anîn derê û xistine ber barê hêstirekê.  
Berî ko ew çeperî bihêlin û rêya vegeerê bidin ber xwe, Şêroyî çavên  
xwe  
di nav serbazan de gêrandin û çû hindav efserekî û stêrikên ser  
milên wî  
jê vekirin û xistine di berîka xwe de û bi erebî gote serbazan:  
— Hûn baş dizanin ko em dikarin we niha bikujin jî, lê ew ne ji kul-  
tura me kurda ne û pêşmerge ne kujek in. Serdarên we,  
desthilatdarên

Bexdayê kujek in û kuştinê bi destên we dikin û weha we jî mîna  
xwe  
dikin kujek û weha kupiyên xwe li her derekê çê dikin û mişê dikin.  
Em  
li dijî şerî ne û em miletek in daxwaza mafên xwe yê mirovîni û  
neteweyî  
dike. Em dixwazin li ser axa welatê xwe bi azadî û bi cîrantiyeka  
xweş li  
gel we û cîranên din bijîn, lê serokên we yê diktator dibêjin na. Ma  
çi ji  
wan kême û bi van kiryarên wan çi ji wan kême dibe? Wan hemû  
tiştêk  
heye û ew di qesr û bîlayên xwe de, bi xweşî û êmnahe û dûrî şer û  
tirsê  
dijîn û yê weko we û miletê me di bive û şer û kuştinê de dijîn. Bi  
vî  
şeweyî, ne em û ne hûn rehetî û azadî û xweşiyê dibînin.  
Divêt hûn bizanibin ko hedara miletên mîna me bîndest sinûrên  
xwe

75

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

heye, li ber her tiştêkî û bo heta hetayê bê deng namîne. Evca, ji  
evro  
pêde, destê çi kesekî ji we bi xerabî dirêjî kesekî ji xwecihên deverê  
bibe,  
hîngê, em dilovaniya îro me bi we re kirî, digel we nakin. Hîngê dê  
bersi-

va me bê agadarî hêt û dê gelek dijwar be. Van peyvên me bikine guhark

û bikin guhên xwe.

Piştî ko Şêroyî axiftina xwe bi dawî anî û berî ko bibêje hevalên xwe bidin rê, Segvanî got:

— Rast e em nikarin vê doşkeyê bi xwe re bibin, lê em dikarin wê ji vê

bilindahiyê girêlî xwarê bikin bona ko serbaz wecê jê nebînin.

Gotina Segvanî hate bicîanîn û doşke ji wê bilindahiya berz bo binê çiyayî hate vezelandin. Pey havêtina doşkeyê, her çwar hevalan rêya ber

bi bakûr girt û wan, di rêyê de li nêzîkî sinûrên çêkirî, li cihekê nepenî

çekê zêdeyî xwe veşart.

Roja dîtir, spêdeyê zû, xeberê dagîrkirina çeperê Serê Hemê ji aliyê pêşmergeyan ve, ne bes li devera Berwariyan, lê li Duhok û Zaxo jî belavbû. Çirîska hêviyê di nav xelkê de geşbû ve û tirs kete dilê xinizkar û

xwefiroşan.

Çalakiyên wan çiwir hevalan pitir lêhatin û ya ji hemûyan bêtir deng

vedayî û kêfa xwecihên deverê pêhatî, bûyera berî meh û nîvê bû.

Belê, bi

roj û li ser cadeya giştî wê bûyerê rûda û wê nûcaş û dûvelankên hukumetê xistine di hizirkirinê de li ser xwe û paşeroja xwe û tirs ketinê

bo nav destên pêşmergeyan.

Li ser rêya ji Bêgova tê û diçe Kanîmasê û bi durustî di navbera gundê

Çeqela û Qumriyê de; efserekî û sê serbazên leşkerê iraqî landkrozerek

rawestand û ji siwarên wê daxwaza pênasnameyan kir.

Siwarê ko li sîngê tirimbêlê, bi rex teniştê şofêrî ve rûniştî û cilên leşk-

erê iraqî li ber û pila »muqedem ruknê« li ser milan bû, bi zimanekê req û

fermander got:

— Ma hûn kore ne?! Ma hûn cilên min û pila min nabînin?! Ez efsere »îstîxbaratên firqa« Zaxo me...

Şêroyî, ko pila efseran li ser milan bû, pêyê xwe yê rastê rakir û hêl li erdî

xist û silaveka leşkerî ji wî muqedemî re kir. Û paşî destê xwe yê rastê anî

ve xwarê û bi erebiyeka mûsiliyane got:

— Bibore ezbenî, me dixwest li pênasnameya siwarên din mêze bikin,

eger ezbenî tu li dijî hindê nebî.

— Her çend e we mafê hindê nîne me rabiwestînin û pirsyara ji me bikin, lê xuya ye hûn di karê xwe de micid in û ev di rewşa van rojan de

76 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

û hebûna »usatan« yaxîbûyan pir baş e, lewma ez dê wan bi we re bidim

nasîn, şofêrê simbêl reş û boş û badayî berî ko muqedem biaxive peyivî.

We, efserê bi rex min ve niyasî û eve ez jî berpîrsê partiya Be'is im li

Zaxoyê û her wisa efserê emna Zaxoyê me û herdu kesên li piştê jî rûniştî

ji îstîxbaratên leşkerî ne.

Her di wan gavan de Segvanî deriyê bi rex şofêrî ve vekir û luliya klaşînkofê xiste di guhê şofêrî de. Şofêrî zû tirimbêl vemirand û Segvanî

siwîç jê kêşa derê û hilgirt. Di gel wê livîna Segvanî, Şêroyî jî ew bi serê

muqedemî anî û zû her çwar ji otomobîlê peya kirin û birin bo derveyî

cehdeyê, bo pişt kevîrekê mezin ko li wê derê bû. Segvanî jî tirimbêl ji

rêyê derxist û ajot bo pişt kevîrî. Şêroyî ferman da wan, ko zû kinca ji ber

xwe bikin. Wan nedizanî ew çi ye bi serê wan tê û ka çi diqewime, lê tirsê

ew ji derve û ji hundur de dagîr kiribûn, lewma, wan bê yek peyv bi tenê

jî fermana şêroyî zû bicîanî û man di derpêyan bi tenha de. Lê, Şêroyî li

wan kire qêrî ko derpêyan jî ji pêyên xwe bikin. Yekî ji wan çwar dîlan ko

siwarî paşîya tirimbêlê bû, xwe bîsteh kir û bi erebiyeka şikestî û bi eksin-

tekê kurdî gote wan:

— We xêr e, nê em jî serbaz in û iraqî ne û di ser hindê re emn û îstîxbarat in. Evca heke hûn jî serbaz bin pa ev çî ye hûn digel me dikin?!

— Hevalno! Şêroyî dev lê ma beş û gote hevalên xwe. Berêxwebidinê

me kê girt, me dizê xwe girt. Kurd e û îstîxbarat e û Xudê dizane ka ew dê

îro bi van re biçê kê ve û mala kê xerab bike, yan xuliyê bi serê kê gundî

de wer bike.

Şêroyî her digel axiftina xwe rahişte wî kurdê îstîxbarat, ew da aliyekî û

Bêwar li ber rawestand û paşî wî û Segvanî û Dildarî ew hersê yê din ko

ereb bûn, bi şelîtekê ko bi wan re bû girêdan. Çawa girêdan; hersê rûs,

yek li pey yê din û mukum girêdan. Paşî, Şêro di berîkên cilên wan de

xebitî, pênc dînareka sor bi dest keft. Ew pênc dînar bi lêvên wî kurdê

xwefiroş ve durî û ew bi darekê ve li hindav cehdeyê ji mila û navtengan

ve hilawîst. Ew cihê ew lê hilawîstî ji her hat û çûyekê peya û siwar re xuya

û li ber çav bû. Hersê ereb jî anîn ser cehdeyê û bi darekê ve ko li ser lêva

cehdeyê bû girêdan. Rûs û tazî, muqedem li pêşiyê û yên din li pişt wî;

zikê her yekî ji wan bi pišta yê din ve. Wan li ser kaxezekê jî nivîsand »pêşmerge bi xêrhatina we dikin« û ew kaxez bi darê ve kir.

Wan ew sax di wê rewşê de hiştin û ew li landkrozera wan siwar bûn û

çûn. Wan berê tirimbêla xwe da bo çiyayê Metînî. Rûniştivanên wan gundan hind dît tirimbêleka landkrozera sipî ko ji rengê yên hukumetê

77

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ne, nêzîkî Metînî dibe, çwar serbaz jê peya dibin, cilên xwe ji ber xwe

dikin û cilên pêşmergeyan dikin ber xwe û landkrozerê li wir dihêlin û ew

di Metînî de wunda dibin.

Wê çelengiyê dengvedana xwe ya pir mezin li başûrê welatî hebû û nêzîkî mehekê suhbeta dîwanan ya herî gerim ew bû. Paşî, Şêroyî û hevalan zanî ko ew kurdê îstîxbarat yê ko wan, pênc dînar bi lêvên wî ve

durî, yek ji pîstirîn îstîxbaratên deverê bû û her ew bûbû egera girtin û

xendiqandina gelek kurdên welatparêz û xwegorîker.

78 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

—9—

Carna ko wextê Şêroyî yê vala hebuya, wî hizirkirin û dîtinên xwe di



defterka xwe de dinvîsandin. Wî di dema dawiyê deev çende jî nivîsî:

— »Çima ez weha yê dilnêrm im? Ma dilnêrmî bi van dagîrkeran re dibe? Erê gelo ew dê me ber bi kûderê bibin? Nexêr, dilnêrmî bi van re,

wan li ser me bêtir zal û dijwar dike û perîşanî û bindestiya me mezintir

û domdirêjtir lêdike. Xwe, ya bi serê Besnayê û dapîra wê hatî ji bîra min

naçe, Şahîn û Mîrza, ew gencên dilsax û mirovhez û xweşîmank, her tim

di hizra min de û li ber çavên min in. Xwe bi hezaran, mîna wan ketine

ber şaloka dagîrkeran.

Ma zordariya wan çawa tê jibîrkirin û em û ez her gavek û her rojekê tê

de dijîn, bi çavên xwe dibînin, bêhna wê dikan, tama wê ya nexweş û

gemar li ser lêvên me ye. Belê, kabûsekê bêhinçikker e û ji ser sînga me

ranabe. Lê ez ya rast ji we re bêjim, hê ez dilnêrm im; ez nikarim di nav

xwe de biryareka weha bistînim ko armanca min ya serekî bibe bes kuştin

û jinavbirina neyarî. Bi rastî wexta ez kûr di nav vê pirsgirêkê de diçim;

em ji wan bikujin û ew ji me û ne em jinav diçin û ne em dikarin wan ji

nav bibin û di herdu çeperan de kuştina mirovan e, çareserkirinek  
û  
dawiyeka dilveker û dilxwaz û nêzîk, bi vî tewrî, bi hêsanî nayê  
berçavên  
min.

Xwe eger ev berxwedana kurdan ya bi sedan salan nebûya niha em  
jî  
mîna gelek miletan ne li ser axa welatê xwe bûna û dibe ko navê  
me jî bi  
yekcarî li dinê ne bûya. Lê ez, carna wekî matmatîkê dihejmêrim, ka  
ji  
destpêkirina şerê çekdar, me çend serkeftin û destkeftin bi dest  
xwe ve  
anîne û çend zîyan bi me keftine. Ya rast encam ji min re ne dilşaker  
e.

Ma hema ew mirovkuj û dirunde, xwe em jî xwe weke wan lînakin.  
Em li dijî wan in çunkî em di rastiye de li dijî reftar û kiryarên wan  
yên  
ne baş û ne mirovane nin. Evca heke me jî mîna wan kir, weko wan  
hizir  
kir û weko wan reftar û kiryar kirin, ev em jî bûn kupiyeka wan û  
kesîtiya  
wan.

Ev ez çi dibêjim, nê em li mala xwe rûniştine û me axa çi kesekî dagîr  
79

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

nekiriye û me çî millet bindest nekirine, ew in; ji welatê xwe hatine  
û axa  
me dagîrkiriye û em jî bindest kirine û ji her mafekî mirovîtiyê û millî  
bêbe-  
hir kirine. Bi top û tank û hemû cure çekên xwe yê sivik û giran û  
ji-  
navbir êrişî me dibin û dibêjin hûn tune ne. Ew ne me weko millet  
diniyasîn û ne jî bi çavekê mirovîtiyê li me dinihêrin. Lê, mirov ya  
rast  
bibêje, ew tadariyê li milletê xwe bi xwe jî dikin, lê tadariya wan ya  
li ser  
me deh qatî wê ye.  
Carna ez şerê pêşmergetiyê û bi xwe jî weha ye, weke qonaxeka  
berwext  
dibînin, weke fişarxistin bo ser dijminî, tengavkirina wî bona ko  
rastiyê  
qebul bike û bi pêşmergeyan re rûne û li ser daxwazên wan gift û  
goyan  
bike û mafên mirovî û milletê me bipejirîne, dibînim. Xwe, di  
piraniya wî  
prosesî de dijminê dagîrker dixeyide û dijiwariya xwe zêdetir lêdike  
û bi  
wî awayî milletê me perîşantir dibe û zîyanên mezintir digehinê. Lê  
di  
eynî wextî de, digel zêdebûn û bilindbûna pêla zordarî û  
tadakeriyên  
dagîrker û diktatorî, rîq û kîn û berxwedana milletî û opozisyonê  
mezin-

tir û berfirehtir lê dihêt.

Lê mixabin, digel hindê ko me ew hêza leşkerî û abûrî ya dijminî di dest

xwe de nîne, em di nav xwe de jî ne yek in û muxtar û gizîrên me pir in û

kes ji wan, xwe ji yê din kêmtir nabîne û her yek xwe ji hemûyan çêtir û

zîrektir û zanatir û lêweşawetir dibîne û her kes xwe bi rêber û serok dibîne. Bi vê serreqiya wan, barê milletê me sedqatî girantir bûye û rê li

ber dagîrker û siyaseta wan ya tepeserkrina me hêsantirbûye.

Wextê ez helbesta Xaniyê nemir ko berî ji 300 salan bêtir di Mem û Zîna xwe ya navdar de nivîsandiye bi bîra xwe tînim, ez pir li ber xwe dikevim, hingê Xanî nivîsandibû:

Ger hebûya me itifaqek

Vêk ra bikira me inqiyadek

Rom û ereb û ecem tamamî

Hemiyar ji me re fikir xulamî

Tekmîl fikir me dîn û dewlet

Tehsîl fikir me ilm û hikmet.

Berî hinde sedsalan êşa me xuya ye, derdê me li ber çav e û ji me re hatiye

destnîşankirin û em dibînin û encamên wî li ber çavên me nin; ji hev ve-

80 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

qetyan û neyegirtin û birakujî û xwegirêdan bi dagîrkeran û xizmeta

wan û siyasetên wan û hê em dev jê bernadin. Ma gelo, heta eger  
rast be  
ko aqilê kurmancî dereng tê serê wî, ma ew derengî bû çî?! Ne herê,  
ez ji  
derheq babetekê weha dernakevim û tê de berzedibim. Ez nikarim,  
yan  
jî min ew şîyan û pêçêbûn nînin ko pê bikaribim ya çêtir û bi xêr û  
bêrtir  
ji vê rêya heta niha miletê me bi dest xwe ve girtî yan hinekan jê re  
hilbi-  
jartî û jê re kiriye rêbaz, ji xelkê xwe re peyda bikim.«  
Salek tê hebû ko Şêro û hersê hevalên wî bi hev re di çalakî û  
xebatên  
xwe de berdewam bû. Gelek kiryar û tevgerên partîzanî li dijî çeper  
û sen-  
ger û binikên leşker û dam û dezgehên dagîrkerî kirin. Xelkê deverê  
ew  
baş nas kirin û wan jî xelik baş nas kir û herdu alî ji hevudu û  
arîkariya  
yekudu dilrazîbûn.  
Wan qet hest bi bêzarî û mandîbûnê nekir. Her gund û her malek,  
gund û mala wan bû û xwecihên deverê ew bi bira û kurên xwe  
dizanîn.  
Pêşmerge bi hêvî bû, ji ber ko miletekê weha xweragir û merd û  
xwe-  
gorîker li piştta wî bû, millet jî ji hêviya rizgarbûn û serkeftina heqiyê  
bi ser

neheqiyê de çiknebûbû, ji ber ko pêşmergeyên weha nebez û  
xwegorîker

û xwedan sinc û tor berevanî jê dikir. Weha pêşmergetî û millet, bi  
dîtina

Şêroyî, timamkerên hev bûn û bê hevudu peyda nedibûn.

Demekê dirêj bi ser de derbas nebû û rêxistinên siyasî yên kurd, bi  
pêşmergeyên xwe ve, hatin qadê. Berî karesatê yek parta mezin  
hebû ko

nûnertiya tevgera rizgarîxwaza kurd li başûrê welatî dikir, lê piştî  
şikesti-

na mezin, weke mêşa hingivînî, kunmêşê şilxe ji xwe dan, lê ka dê  
kîjan

bi hingiv be hê ew ne xuya bû.

Di gel hatina çekdarên partê bo deverê karê her çwar hevalan yê  
hevbeş

nêzîkî dawiya xwe dibû. Ji ber ku, her ji destpêkê, mebesta wan ne  
avaki-

rîna çî part yan çî leşkeran bû û bi hatina hêzeka rêxistî bo deverê  
şêweyê

xebata wan jî hate guhertin.

Hindî Segvan û Dildar bûn, wan xwe da bo nav rêzên pêşmergeyên  
parta, ko di devera wan de xebata wê ya siyasî û çekdarî hebû.

Bêwarî

weko Şêroyî xwe li gundên wan deveran vedihewand û di katê  
pêwîst de

herdu arîkarên pêşmergeyan bûn û ew di bersîngirtina êrişên  
dijminî de

bo ser deverê her tim beşdar dibûn.

Şêroyî dil pir li ser hebû ko bi awayekê rêxistî xebata xwe ya nîştîmanî bike û li gor dîtina wî eger millet û xebata wî ne ya rêxistî û bi serûber be encamên wê xebatê jî dilxwaz û baş nabin. Lê, wî ne dixwest di pirseka weha de lezê bike; ditirsiya ko ew hemû, ya ko ji partê, li ser partê tê gotin

81

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

û di belavokan de digihîje destên wî, ne weha be û her weko caran be û wan ders ji tecrube û bi serhatiyên xwe bi xwe jî ne wergirtibin. Lewma wî xwe girt heta ko ew çêtir û nêzîktir siyaset û kar û xebata wan partan nas bike û paşî biryara xwe bide. Ya ko di navbera hêzên serekî û yên biçûk jî de diqewimî ew gelek di-tirsand; tirsawî ew bû neku ev hêze wê kerb û kîn û hevrikatiya xwe ya şexsî û siyasî di qada xebata îroyîn de sax bikin ve. Û welê hat û bi taybetî di navbera dû hêzên serekî de. Her aliyekî deverine xistine bin destên xwe û li aliyê din qedexe kirin û her terefekî xwe ji yê din bi şoreşgertir û çep-

tir danî. Çeptir; ji ber ko wan şoreşgerbûn û çepbûn yan  
welatparêzîbûn  
û çepbûn kirine dû peyvên pêkvegirêdayî, welê kirin ko nabe, di  
ferhen-  
ga siyasî ya kurdî de, ew herdu peyv, bê hevudu hebin.  
Belê welê hat, yê ko di çaxê axiftinê de navên Lenîn û Marks û Encils  
û  
Fîdel Kastro û Gîvara û Mao û peyvên markisîzm û lenîninizm û  
madiya  
diyalektîk û madiya tarîxî û htd. ji devî dernekevin, ew ne mirovekî  
şoreşger e û çî ji welatparêziyê nizane. Hemû tişt têkelbûn; xebata  
neteweyî, xebata çînayetî, şerê çekdarî, şoreşgerî, xinizkarî,  
çeprewî, bur-  
juwa û bê hejmar tiştine din ko diviyabûya ew tevlihev nebûna,  
têkeldibûn.  
Şerê navxwe yê hêzên çekdar yên Kurdistanê bû rastiyeke û  
berfirehtir  
bû û senga herî mezin kete ser hindê ka kîj hêz dê ya din bişkêne û  
dê wê  
li cem milletî rûreş bike. Milletê hejar û perîşan ko çavên wî li  
qurtalkerên  
wî bûn ko hev bigirin û bi hev re kar bikin û wî zû ji wê qurbeseriyê  
riz-  
gar bikin, dît ko tişt berûvajî daxwaza wî çê dibin û serkêşên milletî,  
milletî  
dikin parçe parçe û kiş dikine hevûdu.  
Ya ji hemûyan jî zehmettir, dîtin û lênerîna milletî jî di destên wan  
de



bû; yek ji ber ko piraniya miletî nexwendewar bû û yê du rêzrîzk jî dizanîn xwe li ser wan dikire paşa û zana û miletî jî jê bawer dikir û guh-

dariya wî bi dilê xwe yê sax dikir. Ya duwê, rojname û radyo, yan yê

hêzeka siyasî ji wan hêzan bûn yan jî yê hukümetê bûn û weha çi tiştê

serbixwe nebû ko rastî jê bigehe miletî û weha bes fîkreya wan hêzan yan

ya hukümetê digehişt miletî û weha dîtina miletî jî ji dîtina wan çêdibû

û weha milet jî hevrûşî yekudu dibû.

Şêro ji metod û siyaseta navxwe ya hêzên siyasî yê di qada xebatê de

bûn, bêzar bû, lê hêviya wî di hindê de bû ko rêçare heye eger serkêşên

partan hez bikin problemên navxwe çareser bikin û senga xebata xwe ber

bi armanca hevpişk ya nîştîmanî bajon.

## 82 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Wî bi çi rengê veger bo nav deverên li jêr kotrola hukümetê, bi wî destûdarê hukümetê pê desthilata xwe birêvedibir, nêzîkî hizra xwe nedikir û çi çare di wê de ne didît. Wî çi gêngaşe li ser wê manê di dev-

erên rizgarkirî de nebû, lê ko bimîne û şerê birayê xwe yê kurd bike, bes

ji ber hindê ko dîtin û hizir û baweriyên ji hev cuda hene, ew bi çi renekî

li gel nebû û bi dijwarî li dijî hindê bû.

Rewşa navxwe ya çirhayî û dirhayî ya heyî, ew tûşî şerenîxeka dijwar ya

nevxweyî kir û dikir nedikir nikaribû bi xwe çareyekê ji pirsgerêkê re pey-

da bike. Alternatîv jî di serûberekê weha de, ko şer bû û çekdar û çek zi-

man bû, pir zehmet bû ko bêt û cihê xwe bi metodên baş bike.

Diviyabûya ew alternatîv yan girêdayî hêzekê ji hêzên serekî bûya yan ew

jî biketibûya şerî digel û eger wê şer jî nekirbûya, ew dê bi topizê hêzê bi-

htaya bêdeng kirin.

Tişt hemû di nav wî de ketine serêk û pêwîstiya wî bi kesekê nêzîk û

hebekê zana hebû ko pê re wan probleman munaqêşe bike. Hate bîra wî

hevalê wî yê biçûktiyê Zîrek. Zîrek di wî heyamê dawiyê de bûbû mamosteyê matmatîkê li xwendingeha navincî ya bajarkê Bamernê.

Zîrek jî di zaroktiya xwe de li bajarê Mûsilê bû û wan li wê derê hevudu

nas kiribû. Zîrek ji wan kêr kesa bû ko pir kurdistançî û têrrewşenbîr

bûne. Şêroyî biryar stand ko biçê cem Zîrekî, hem bo seredan û hem jî

bona ko digel wî, li ser rewşa welatî biaxive.

Hêzên hukumeta Iraqê bi roj dikeftin hundurê Bamernê û bi şev ji tir-

sa pêşmergeyan jê derdikeftin, lewma Şêro jî bi şev, weko her pêşmerge û

fîlarbûyekî çû wê derê.

Dema Zîrekî dergeh vekirî, bawer ji çavên xwe nekir ko ew Şêro ye, hevalê wî yê biçûkîniyê, herdu çûn ser û stuwên yekudu. Zîrekî zanîbû

ko Şêro li deverê pêşmerge ye û weko endamê parta »X« û pêşmergeyekê

wê yê mêrxas, nav û dengê wî çûye. Zîrekî bawer dikir, ko çawa gotina

mezinan dibêje »çiya bi çiya nakevin, lê çav bi çavan dikevin«, dê ew û

Şêro jî hevudu bibînin, lê ne weha ji nişkan ve.

Zîrekê zegurd, birinc û avika mirîşkê ya nîvro ji xwe re durustkirî danî

ber mêhvanê xwe û paşî çî jî çêkir û di ber çavexwarinê re axiftinê

kêşa û ji bîrhatinên zaroktiyê û kûlanên Mekawî û Dekit Berge û

Cemmase û Seriçxane li Mûsilê hatin bo ser perîşaniya millet tê de û

pêşmergetiyê û şerê birakujiyê. Zîrekî dest bi pirsyarê kir û gote Şêroyî:

— Ma ev hûn çûne çiyayî û bûne pêşmerge da şerê hevudu bikin yan

da me ji bin vî barê giran qurtal bikin? Baş e ma hûn di partên xwe de

83

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

rexneyê li serkirdayetiyan xwe nagirin û nabêjinê ko eve ne daxwaza we

ye û divê ew dev ji van çewtiyan ber bidin û hêzên xwe ji pêxemetî milletî

û parastina berjewendiyên wî yên berz û pîroz bidin yek?

— Berî her tiştekî birayê delal ez ne endam im di çi partekê de, Şêroyî

dest bi şirovekirina rewşa xwe kir. Ez, her ji ber van egeran bi xwe jî ne

bûme endamê çi partekê ji partên di qadê de. Ez, bo agadariya te, niha

bes di bergiriya millî de me. Ya ji dest min, bo çakiya xelkê me û parasti-

na deverên rizgarkirî têt, ez dikim. Ez, li dijî êrişên leşkerê Iraqê bo ser de-

verên azadkirî hemîşe bi pêşmergeyan re me.

Zîrekî bi guhên xwe yên guhişî û bi mereq guh dida axiftina Şêroyî û bi

taybetî dema qala şerê navxwe dikir û ka çend pê diêşiya. Zîrekî, ji peyivîn û livîna navçavên wî û xema li ser dêmê wî xuya, dilsoziya wî ya

rastîn bo milletî û doza wî dît.

Şêro nikaribû fêm bike ka ew çima hêzên kurd ko hê azad nebûne  
û hê  
dewleta wan çênebûye, şerê hevudu dikin û berî azadkirina  
Kurdistanê ji  
dest dagîrkeran, wê di navbera xwe de li ser xwe dabeş dikin.  
Zîrekî dizanî kûdera Şêroyî diêşe, ji ber ko ew jî wekî wî û weko pi-  
raniya kurdan bi wan bûyeran diêşiya. Zîrekî dizanî ko pirs pir  
zehmet e  
, ji ber ko yê li serî guh nadine binî û eger guh bidinê jî, dê hîngê  
guhê  
xwe bidinê heke hat û ew dîtin di berjewendiya wan de be, yan  
heke hat  
û çî rêyên din di dest wan de neman û neçar bûn.  
— Her kurdekê bêhna welatparêziyê jê bihêt dê li dijî vê rikeberiya  
malxerabker û birakujiyê be, Zîrekî raya xwe ji Şêroyî re anî ziman.  
Ez,  
her ji destpêkê li dijî van metod û kiryarên şaş û nebaş di tevgera  
azadîxwaza kurd de rawestiyame û min, bi awayekê vekirî, rexne li  
wan  
kêmasiyan girtiye. Ez, ji ber hindê jî gelek caran, bi awayekê ne ru  
bi ru,  
hatime agehdarkirin ko ji min re ne baş e ez bi wî şêweyî qala filane  
û bêh-  
vane partê dikim. Lê belê, min heta niha guh nedaye wan û çî dikin  
bila  
bikin. Wextê ez dihêm ser alternatîvê, ez pê re me, eger tiştê nû  
û çêtir

ji xelkê me re pê re be. Xwe, min di vî warî de pêngavine jî havêtine;  
piştî

şikestina 1975-ê, min û hevaline xwendekar rêxistineka kurdî  
damezrand.

Armanca me ya serekî û ya ji hemûyan giringtir belavkirina bîr û  
bawerên

azadîxwaz bû di nav xelkê me de.

Piştî demekê xuya bû ko rêxistinine din jî, ji wî terzî hebûne û piştî  
danûstandinên me digel hevûdu, me û wan rêxistinan hev girt û rêx-  
istineka mezin jê peydabû. Hinekan xwestin wê bikin partek, lê em  
gru-

pa birêveber ya wê li dijî wê hizrê rawestiyan û bi dîtina me, em ne  
di astê

#### 84 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

hindê de bûne ko em bibin parta alternatîv. Ji ber wê biryara me,  
gelek

endaman dev ji wê rêxistinê berda.

Piştî şerê birakujiyê dest pê kirî, me dît ko gera rola me hat ko em  
tiştêkî

bikin. Evca, me di komîteya birêveber de pêşniyarek pêşkêşî  
hevalên di

rêxistinê de kir û ew pêşniyaz bû biryar; ko her çend endam bikevin  
nav

hundurê partekê û dest bi belavkirina van bîr û baweran di nav  
rêxistinên

wan partan de bikin:

— Birakujî xinizkariyeka mezin e û ew çarenivîsa gelê Kurdistanê têxe

nav xetereka mezin û di xizmeta siyaset û berjewendiyên dijminê de ye.

— ko divêt pêşmerge birayê xwe yê kurd nekuje û nerazibûna xwe bi

devkî, bi nivîskî, bi çekdanînê diyar bike.

— Berevaniyê ji karê hevbeş yê kurdistanî û pîrensîpên demokrasiyê û

sîstema pîrpartîniyê û hevgirtina wan ji bo bergirîkrinê ji berjewendiyên

neteweyî û nîştîmanî yên bilind û ji bo bicîanîna armancên serekî yên

bizava rizgarîxwaza Kurdistanê di azadî û aştî û parastina mafên mirovî û

demokarasiyê de li Kurdistanê bikin.

— Çêkirina bereyan yan parlamentoyan di her parçeyeka welatî de û

durustkirina eniyeka hevbeş ya hemû Kurdistanê ji bo hevkarîkirin û

karê hevpişk yê kurdistanî di nav tevgera azadîxwaz de, li her çwar parçeyên welatî û kurdên sovyetistanê û welatên din.

Zîrek vê re çû û got:

— Ev ji erkên serekî yên me nin û hevalên endam bi giştî digel biryarê

û bicîanîna wê bûn û biryar ketiye jiyanê jî. Mebesta me ne ew e ko rêx-

istinên van partan li dijî serkirdayetiyan partên xwe serî hil bidin,  
nexêr,

lê em dixwazin ko ew, tiştê xelet û ne di xizmeta gelê Kurdistanê de  
be,

qebûl nekin û hewil bidin serkêşiyên xwe qayîl bikin ko dev ji wan  
çewtiyan ber bidin û siyasetên xwe yên xar û vîç biguherînin. ko  
senga xe-

bata xwe li cihê ko bi hemû ve bêxin ber xizmeta partên xwe, di  
piraniyê

de bêxin ber xizmeta gel û welatê xwe, ko siyaseta kevin ya hemû ji  
bo

partan biguherin bi siyaseta hemû partî, bi hemû şiyar û pêçêbûnên  
xwe

ve, ji bo xizmeta gel û welatî.

Axiftina wan dirêj bû û dumahîk diyar ne dibû û diviyaba Şêro berî  
berbangê ji gundî derkeftiba û hê mala xaleta wî ma bû û diviyaba  
ew çû-

ba seredana wan jî heke da dayika wî pir jê bixeyide eger pê  
bizanîba ko

ew hatiye Bamernê û neçûye seredana wan.

Mala xaleta wî ji mêvanan pir bû, hin gundî û hin jî pêşmerge û  
rêving

bûn. Piştî bi xêrhatin û pirsas kes û kar û rewşa wan, suhbata dîwanê  
ger-

85

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

im bû ve, di wî wextê de ko keça xaleta wî jê pirsî:



— Erê Şêro! Dîtina te li ser vê birakujiyê çi ye?  
— Ma ez çi bibêjim, Şêroyî bi vî awayî dest bi bersivdanê kir. Ya ez dizanim ev kare karekê bê aqilane ye û şerim û fihêtî ye bo van rêveberên me ko birakujiyê têxin nav me. Bêguman her kesekê nîştîmanperwer û dilsoz li dijî pevçûna navxwe ya çekdar e, lê ew bes nake, divê her kes ji me wî helwêstê xwe aşkira bike û rexneya xwe bigehîne wan aliyên ko bi-rakuji li ser destên wan tête kirin. Neyar û dijminên milletê me bi mily-onên dînanan li ser hindê dimezixînin bo ko kurd yek negirin û xelkê Kurdistanê bi hefka yekudu ve bin û şerê hevudu bikin. Evca bi awayekî îndîrekt terefên beşdar di şerê birakujiyê de xizmeta van nehezan dikin û roja serbestbûna gel û welatî gîro dikin û bi zehmettir lêdikin. Bêguman, her kurdek dizane ko em hindî nebin yek û hêz û zanîna milletê xwe nedin ser hev, em nikarin zora dijminên xwe bibin û neşên milletê xwe ji vê perîşaniya tê de azad bikin. Şêroyî dixwest hema her li dijî şerî bi axive, lê çi peyv û hizrên nû nebûn û hema her dubarekirina eynî peyv û hevokan bû. Spêde nêzîk dibû û

neçarbû ko xatra xwe bixwaze û berê pêyên xwe bide ve ber bi  
devera

Berwarî Bala. Di rêya vegeerê de Şêroyî hest bi hindê kir ko barê wî  
sist

bûye û xwe di wî helwêstê xwe de, nedît yê bi tenê, lê berûvajî wê;  
wê dît

ko piraniya xelkê welatê wî xwedî helwêstê wî ye. Lê problem di  
hindê de

bû ko piraniyê helwêstê xwe bi ziman ne xistiye, lê bi lênerîna wî da  
xuyakirina helwêstî pêngava piştî wê be.

Ya keyfa wî pir pê hatî ew bû ko millet hişyar û çav zil bû. Bi dîtina  
wî

di rewşeka weha de, diviyabûya wan partan dev ji wan çewtî û  
kêmaniyan

bebidana, heke dê millet ji wan dûr bikefta û dê ew bimana bi tenha  
serê

xwe weko rêxistinine biçûk û bê xelk. Ê bi hizra wî, bê milletî jî çi  
rêx-

istinek nikare pêş bikeve û zû lawaz dibe û gelek xwe li ser pêyan  
ranagire.

Ew nêzîkî nîvro gihaşte gundê Çem Seyda û yekser çû mala Bêwarî,  
ko

piştî jinanînê li wir binecihibûbû. Di mala Bêwarî de, ew ji westiyana  
û

nenivistinê yekser raket û nivist. Êvarî, Nermînê, jina Bêwarî, Şêro  
ji xew

rakir bona ko şîvê bixwe. Li ser sifrê û li ber xwarinê suhbet çû ser  
şûkirin

û jinanînê. Ew ji mêje bû Nermînê kiribû dilê xwe ko ji Şêroyî bipirse  
ka  
ew dixwaze jinekê jê re bixwazin û eger wî pêwîstî bi arîkariya wê  
hebe,  
ew ya amade ye û di gundî de keçine hene ko hez dikin şû bi wî bikin  
û  
wan ji Nermînê re gotine ko li ser wî babetî tişteki ji Şêroyî bizane û  
wisa  
Nermînê pirsyar jê kir.

## 86 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Ez jinê bînim? herê...herê, hema ew ya mayî ko min nekirî, Şêroyî  
bersiva Nermînê da. Bi Xwedê min taqeta çî jina nîne û hema hosa  
xweştir e.

— Hey malxerabnek, Bêwarî li ber devê wî da. Segvanî yê ko nefret  
ji

jina dikir, jinek xwestiye û mehir jî kiriye û dê di van nêzîkan de ve-  
biguhêze. Evca çîma tu xwe yaxî dikî û hewil nadî xwe ji wan hizrên  
xwe

yên kevin azad bikî. Nê jiyê me diçe û ya diçe navegere û kesek ji  
me heta

hetayê xurt û genc û li ser xwe namîne. Divêt li bîra te be, heke  
mirov ji

hêza xwe keft çî bi axînkrahêlan û peşîmaniyê nahête guhertin.

— Segvanî jinek xwestiye û ez nizanî? bi mendehoşî Şêroyî ev pirs  
kir.

— Aha niha hate bîra min ko diviyaba min gotiba te, çinkî wî xeber  
ji

te re jî şandibû lê tu li vir nebûyî, Bêwarî anî bîra xwe. Û divê em herin  
daweta wî. Tê bîra te, wî çawa henekên xwe bi min dikirin û digote min  
here rûne ber teniştê hurmetekê û zaroka çê bike. Aha nuke wî Segvanê  
ko xwe ji jina dida paş, keçek ji Çelê xwestiye û wî jî xwe gihande karwanê  
me û tu di zegurdîtiyê de, bi tenê hêlayî.  
Van gotin û xeberên Segvanî û jinanî kartêkirina xwe li ser wî hebû,  
lê çî negot û bi xwe re di nav xwe de gote xwe:  
— Yê dizane dizane û yê nizane baqê nîskan e. weko kurd dibêjin  
»SO-  
tim nayê gotin« bes ma bo kê bibêjim û dê bighîje kûderê.  
— Keko Şêro bilind nefire heke dê ser û ser û bi erdî bikevî, Nermînê axiftin careka din arasteyî Şêroyî kir ve. Di gundî de gelek keçên ciwan û  
xweşimank û bi kêrhatî hene û wan çavên xwe danîne ser te, lê tu çî pûte  
bi wan nakî. Evca lezê bike heke piştî çend salekên din ya mê be bi dest  
te nakeve.  
Şêroyî bes guh dida wê û li ser xwarina xwe yê berdewam bû. Piştî xwarin bes kirî û xwe ji ber sifrê daye paş, perdaxa avê bi ser devê xwe de  
kir û pala xwe da balîfkekê. Berê xwe da Bêwarî û Nermînê, yê ko

çaverêyî axiftinekê bûn ko ji devê wî derbikeve û paşî hêdî û li ser xwe got:

— »Eger we ya rast bivêt, ez heta niha di wê bawerê de bûm ko jinanîn

bo kesên xwe bi şoreş û pêşmergetiyê ve girêdidin nebaş e. Çunkî, bi hizra

min jinanîne pêwîstî bi akincîbûnê heye û şoreş û pêşmergetî neak-incîbûn û paşerojeka ne xuya û ne di destê mirovî bi xwe de ye.

Jin û jiyana rojane ya navmalê û berpirsariyên malê dibin asteng di

rêya xebata rojane ya pêşmergeyî de. Canê pêşmergeyî li ser destên wî ye

û nabe li direka destnîşankirî bimîne û divêt yê livok û civok be û her tim

87

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

di tahluke û xeterê de ye. Dema diçe operasyonekê nizane ka dê bi saxî

vebigere yan jî dê hête kuştin. Divêt pêşmerge xwe bi hemû ve bide ber

xebatê ji bo bi destveanîna mafên gelî yên mirovî û neteweyî û bi wê xe-

bata xwe ew ji milletî re dibe sembol û hêvî û millet xwe dihêle bi hêviya

xebat û xwefîdakariya wî ve. Lê çaxê pêşmerge jinê tîne û malbatekê

dadimezrîne, wê gavê ew wext jê re namîne. Ji ber ko çaxa mirov  
jinê tîne  
divêt mirov bizanibe ko jinê û malê û paşî zarokan û bixwedîkirina  
wan  
pêwîstî bi wî û wextê wî û pêwîstî bi pereyan û xawrinê heye û çî  
tiştêk jî  
ji kulînê nayê xwarê.  
Bi destxistina pereyan jî, ji bo birêvebirina jiyana navmalê ya rojane  
pê-  
divî bi karkirinê heye.  
Pêwîstiya malê bi xwarin û vexwarin û xizmet û sxbêrîjêkirina  
zarokan  
û tiştine din heye. Evca eger zilamî ew berpirsariyên navmalê û  
berpirsariyên xwe li hember jina xwe bicîneanîn dê problem hêne  
pêş. Ji  
hemuyan jî giringtir nêzîkahiya mêrî ji jinê ye, ko ew bi başî cih  
negire jin  
nerazîbûna xwe diyar dike û dibe pitpita wê. Pit pitê dike ji ber ko  
barê  
giran keftiye ser milên wê bi tenê û di civaka me de, ya ko mêr tê  
de ser-  
dar, hemû tişt bi dest jinê nayên bicîanîn û weha mal dibe dozex û  
jiyan  
li sinûrekê xerab radiweste.  
Eger mirovî guhê xwe baş da malê û bi erk û berpirsariyên xwe li  
hem-  
ber wê rabû, wê gavê wext bo mîletî û wê xebata rojane namîne û  
bi wî

rengî jî pêşmergetî nayê kirin. Hema em niha li van deran bi çavên  
xwe  
dibînin ka çawa, ji bêgaviyê, gelek ji pêşmergeyan dev ji  
pêşmergetiyê ber  
didin û berê xwe didin bazirganî û qeçaxtiyê bona ko mala wan ji  
dest  
wan dernekeve û bikaribin wan ji birs û muhtacbûnê biparêzin. Xwe  
heke pêşmergeyî jêderekê mehane bo jiyane, têra xwe û mlabata  
xwe  
hebûya, hîngê rewş bi vî terzî ne dibûya.  
Ev, dîtî û awirên min bûn di warê jinanînê de, lê eve demek e, roj  
bi  
roj, dîtîneka din li cem min cih digire.«  
Bêwarê ko bi jina xwe re, weko her gav ko Şêro diaxift, bi mereq  
guh-  
dariya wî fikir, peyivî û zû gotê:  
— De, Xudê xêr bike, belkî dawiya vê dîtina te ya nû jinanîn be.  
— »Ez gehiştîm wê rastiye ko weha nabe«, Şêro vêra çû û axiftina  
xwe  
domand. »Çunkî min gote xwe, pa eger hemû kurên Kurdistanê  
xwestin  
bibin pêşmerge û ji ber hindê jin neanîn, hema bi wî awayî eve me  
bi xwe  
bi destên xwe tovê xwe birand. Bêguman şaneya biçûk ya her  
komelekî  
mal e, bi damezrandina wê, rê li ber zarokbûnê û bixwedîkirin û  
mezinki-

88 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

rina zarokan vedibe û weha hebûna miletî tê parastin.  
Û heta dawiyê jî weha nabe; çî zû û çî dereng dê serhildana gelê me  
rengê din bi xwe ve bîne û dê, eger ne tevaya miletî, piraniya wî,  
bi  
awayekê dîrekt, beşdarî xebata xwe ya nîştîmanî bibe. Xwe xebat ji  
bo  
azadiya miletî ne bes erk û karê zilamî bi tenê ye lê ew bi heman  
şêweyî  
kar û erkê li ser milên jinê ye jî. Ez dirêj nakim û serê we bi vê  
felsefeyê gêj  
nakim. Kurt û kurmanc, gava mirovî hevaljîna xwe dît û dilê wan  
kefte  
hevudu û bikêr yekudu hatin, ya çêtir ew e, hindî zûtir e, ew şahî û  
goven-  
da xwe bikin.«  
— Ma tu vê ji kê re dibêjî, hema te ji her kesekî bêtir pêwîstî bi van  
şîretên xwe heye, Nermînê xwe negirt û ya di dilê xwe de danî ber  
wî. De  
tu jî hiçka hilbide û binkofkekê ji xwe re peyda bike.  
Weke carên pêşîn, wê carê jî Şêroyî xwe ji gêngaşeyê bê biryar  
hilanî û  
perde ji ser dilê xwe ne hilanî. Di nav xwe de hest bi wê pêwîstiyê  
dikir û  
gehiştibû wê rastiye ko jin ji wî re jî, mîna her zilamekî, giring û  
pêwîst e.  
Ma ew da heta kengî wî dehbeyê xwe bi destên xwe rehet bike û  
xwe li ber



çavên xelkî bi sofî îne pêş? Wî wê gavê hizra hindê dikir û ji wê ditirsiya  
neku ew bi negatîvî kar bike ser psîkolojiya wî û di wan dawiyana de,  
gelek  
ji malxulyan û xewnên wî girêdayî jina û laşê wan bûn.  
Belê, her çend e wî ji çi kesekî re qala hindê nekiribû, lê wî biryara  
xwe  
dabû ko ew li dawiya jiyê xwe nebe mirovekê girêlok û ji xelkî veder,  
lê  
ew jî jiyane bi awayekê normal bajo û jinekê ji xwe re peyda bike.  
Xwe,  
wî, di wan heyama de, ji her wextekê dîtir pitir, hest bi hindê dikir  
ko  
pêdiviya wî bi kesekî heye ko bikaribe ligel wî, bê şerim, bê  
çaplêdan û  
badan, danûstandinên xwe bike. Kesek hebe, gelek ji wî nêzîk be,  
hez ji  
wî bike, wî fêhim bike û ew jî hez jê bike. Kesek be, baweriya wan  
bi he-  
vudu hebe, bikaribe dilê xwe jê re vebike û nihîniyên xwe bêxe ber,  
nava  
xwe li ber bikelêşe, û bi dîtina wî kesên weha jî da cotkên jin û  
mêran bin.  
— Lê ew jin dê kî be? ev pirsyar ji xwe kir.  
Digel pirsyarê yekser hizra wî çû ser Nazenînê. Berî çendekê, dema  
dayika wî hatibû seredana wî, gotê ko hê Nazenîn li benda te ye.  
Mala Nazenînê li Mûsilê bû û ew taqaneya bab û dayika xwe bû.  
Babê

wê paleyê avakirina xaniya bû. Nazenînê berî salekê xwendina xwe  
ya  
amadeyî bi dawî anîbû û li wê salê li Zankoya Mûsilê li fekulata fîzîkê  
dest  
bi xwendina xwe kiribû. Mala wan, bi rex mala Şêroyî wan ve bû û  
ew  
hevala wî ya zarokiyê ya pir nêzîk bû.  
Wî di tere genciya xwe de pir hez ji Nazenînê dikir, lê çî cara bisteh  
89

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

nedikir destê xwe dirêjî wê bike, li cem wî, wî çaxî, karekê weha,  
berî  
şûkirinê, gunehkariyeka mezin bû. Dibe ew ji kartêkirina sexbêriya  
nav-  
malê ya ayînî û konservatîv bû û dibe jî hem bi egera pirtûkên ko wî  
dixwendin û hem jî temaşekirina wî li filmên hindî, ko pir hez jê  
dikir,  
ew sofitî di nav wî de hatibû çespandin.  
Xwe hîngê, film û sînemaya hindî Iraq vegirtibû. Filmên wan di pi-  
raniya xwe de drama bûn û li ser viyana paqij bûn. Tê de keç û kuran  
maçî hevudu nedikir. Di wan filman de babetekê hevbeş hebû, ew  
jî şerê  
qencyê bû li dijî zulm û xerabiyê. Dema mirovî temaşayî filmekê  
hindî  
dikir diviyaba sê çwar destmalên wî li ber destên wî ban bona ko wî  
pê  
rondikên xwe zuha kiriban.

Evîna Şêroyî jî bo Nazenînên ji wî rengî bû, wê dil û can û giyanê  
Şêroyî dagîr kiribû û Şêroyî helbest pê divehandin. Rast e hê wê  
evîne  
sinûrên dil û çavan derbas nekiribûn, lê çavan jî zimanê xwe heye û  
bi  
taybetî li cem evîndaran.  
Di cara dawiyê de ko ew bi mêvanî li mala wan bû û bi amadebûna  
dayik û babê wê, wî ew helbesta ko wî bi wê raçandî ezber xwend.  
Belê,  
xwe bisteh kir û stirana dilê xwe bo wê li ber çav û guhên dayik û  
babê wê  
got, lê, di helbestê de navê Nazenînê kiribû Sînem. Helbest dixwend  
û di  
ber re awirên xwe berdidane ser Nazenînê û bi çavên xwe digotê  
»ev,  
viyana dilê min e, ez ji te re dikim diyarî«. Xwe ji awayê xwendina  
wî û  
livînên destên wî xuya bû ko ew qala Nazenînê dike û dayik û babê  
wê jî  
hest bi hindê fikir, lê wan hez ji Şêroyî fikir û dizanî ko ew kurekê  
baş û  
li ber xwe rawestiyayî û rehet e. Heta wê gavê jî, ji wan hemî  
helbestên wî  
nivîsandibûn, ew li bîra wî ma bû û car bo car bo xwe digot û weko  
sti-  
ranekê di bin lêvên xwe re dilorand. Helbesta wî jî eve bû:  
Ma tu dzanî  
Çend aşiq im ez hevalê

şîneçava ez dîn kirim  
Li deryaya eşq û vînê niqo kirim  
Bo warekê dûr ez birim  
Çend hatin ko me jêkvekin  
ko te bkirin  
ko min bkirin  
ko nehêlin evîna me  
Bibe hêzek  
90 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ko hêlîna me dvêt ava  
Lê bgirin hemî derava  
Lê neşyan û neşên dostê  
Ma tu dzanî  
Qute quta evî dilî navê te ye  
Çaktirîn ziman bo me yar  
Axiftina çavên min û çavên te ye  
Bawer neke ez te bhêlim ey Sînemê  
Li hêvya te her dê mînim  
Te çend bvêt û çawa bvêtin  
Bawer neke evîna te kesek bişêt  
J min bdizîtin  
Ya min gotî lêvenabim  
Bo vîna me dê her livim  
L ber got gotka ez nanivim  
Da bo çavên te Sînemê  
Ava bikim warekê buhar lê b evîn  
ko em pevre tê de bijîn

Bi dil xweşî  
Bê kerb û kîn  
ko bgirnijîn bo jiyane  
ko vîna xwe himbêz bikîn  
J xelkê xwe re bkîn diyarî  
Alayek nû bo vî warî  
L ser binvêsîn:  
B evînê nûdbîtin kavil  
B evînê namînin çî kul  
B evînê paqij dibin dil  
B evînê aş dibin yê sil  
Lê bizane ger gotin nebîte kirin  
Ger kenya te nebîte zad bo eşqa min  
Ger ez nebme berevanê evîna me  
Ger çavên min û te yarê  
Ger hizr û bîr nebine yek  
Baş bizane ne evîn e û pê nabîn yek  
Dema wî helbesta xwe dixwend, Nazenîn ji kêf û şerman de sor û  
sipî

91

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

dibû, çav û dêmê wê, bi îşaretine ko bes Şêroyî didîtin, digotine wî  
»ez jî,  
ji hemû dil û canê xwe hez ji te dikim û ji bilî te çî mêra nakim«.  
Şêroyî  
nedizanî dê ewa bi serî hatî rûbide û dê jiyana wî bi yekcarî hête  
guhertin.

Wê rojê, dema Nazenîn ligel wî hat ber derî û wî xatra xwe jê xwestî,  
wê

gotê:

— Şêro, hişyarî xwe be, tu kî ve biçî dilê min digel te ye. Şêro car û  
bar

diyar bibe. Ew helbesta te pir bi dilê min bû û baş bizane ko ez jî  
gelek hez

ji te dikim.

Wê ew peyvên xwe yên dawiyê zû gotin û ji şerim û kêfa hindê de,  
kû

karî ya di dilê xwe de bibêje lawê dilê xwe, bezî bo nav xanî.

Ew yekemîn peyvên evîndariyê bûn ji devê keçekê bi ber guhên  
Şêroyî

ketîn. Ew evîna wan ya çendîn salan, xwe ji zimanê çav û îşaretên  
laşî der-

bas kire qonaxeka nûtir, qonaxa derbirîna evîna xwe bi zimanî û rû  
bi

rûyê yekudu .

Wî ji dayik û kes û karên xwe zanî ko gelek xazgîniyên wê hatibûn û  
wê

bi aşkirahî evîna xwe anî bû ziman û gotibû xazgîniyan »ma ez dê şû  
bi

çend kesan bikim?! Nê ez dezgirtiya Şêroyî me«

Lê, piştî ko Şêro ji zîndanê derkeftî, sîxurên Iraqê bela xwe jê  
venedikir

û ew xistibû di bin zêrevaniyeka dijwar de. Wê reftara polîsên sivîl  
û rêx-

istinên be'isiyan ew bêtir pal dida bo nav çeperê berxwedanê li dijî

hukumeta faşîst. Lewma, ew di pirs a jinanînê de kuh û sist bû.  
Digote  
xwe »pa heke tiştek bi serê min hat, heke ez hatime ve girtin yan  
hatime  
kuştin, paşî dê çarenivîsa Nazenînê çi be? Dê bi tenê bimîne«. Ne  
dikarî  
wê hizrê bêxe di serê xwe de, li ser xwe qebûl nedikir ko keça ew  
hez jê  
dike, tûşî derdeserî û probleman bike.  
Ya bêtir jî ew xav kirî dayika wê bû; wê ne dixwest keça wê şû bike.  
Ew  
jineka tiral bû, hez ji karê navmalê ne dikir û hindî li bîra Şêro bû,  
wê her  
tim digot -serê min diêşe- û bo gerhan û derkeftin û xwarinên xweş  
jî kes  
ji wê zîrektir nebû. Wê xwe bi serêşiyê dianî pêş bona ko çi karê  
navmalê  
neke û ew hemû bi hêviya Nazenînê ve diman. Nazenînê, di ser  
xwendî-  
na xwe de karê navmalê jî dikir û bo dayikê xweş lê hatibû. Babê  
Nazenînê hez dikir ko Nazenîn şû bi Şêroyî bike, lê dayik bûbû  
asteng.  
Dema ko dayika şêroyî du sê cara ew babet digel dayika wê vekirî,  
wê dig-  
otê:  
— Ma em dê kê ji Şêroyî çêtir ji keça xwe re bibînin, lê hêj keça min  
ya

biçûk e û niha ne jina bermala ne û hêj wê xwendina xwe bi dawî  
ne  
aniye.

## 92 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Şêroyî biryara xwe stand û kaxezek ji dayika xwe re şand û kaxezek  
bo

Nazenînê jî pê re bû û di kaxeza xwe de bo dayika xwe, jê xwestibû  
ko ew,

wê kaxezê bigehîne destê Nazenînê û bersiva wê bi destê xwe bo  
wî bîne.

Di kaxeza xwe de bo Nazenînê ev çende jî nivîsî bû:

— »Nazenîn! Min her tu viyayî û her tu divêyî û ez pir ji dil hez ji te  
dikim, lê ez naxwazim serê te bi arêşe û gîr û girift û sergêjyên xwe  
ve

mandî bikim. Ez hez dikim, eger min jinek hebe, tu ew jin bî, lê ez te  
naxapînim û rastiye ji te re dibêjim ko ez nikarim ji te re çî mala  
dabimezrînim. Min, niha, çî serekaniyek nîne ko pereyek jê bihête  
nav

destên min û pê bikaribim malekê rabigirim. Ya pêşmergetiyê jî,  
min ev

rêye ji xwe re hilbijartiyê û hindî ez yê saxb im û hindî pêwîstiya gelê  
min

bi pêşmergetiyê û her rengekê dî yê xebatê hebe, ez dê li ser  
berdewam

bim. Ez dê li vir pir dilxweş bim eger tu wê hilbijêrî ya ko ji te re çêtir  
e û



bawer bike tu çî hilbijêrî, ez dê pê kêfxweş û şad bim. Eger tu bi min  
û  
jiyana min û rewşa ez tê de razîbî û tu birayarê didî ko şû bi min bikî,  
di-  
vê tu bizanî ko dê jiyan me pevre jiyaneke sext û dijwar be û  
xweşbûn  
û nexweşbûna wê girêdayî pirsgirêka gelê me ye û çawatiya  
paşeroja wê.«  
Şêroyî, pir ji dil dixwest, careka din peywendiyên xwe bi Nazenînê  
re  
nû bike, lê bersiva kaxezka wî ne hat û bi dîtina Şêroyî nehatina  
bersivê û  
bê dengiya wê nîşan bû li ser guhertinekê di helwêstê Nazenînê de,  
nîşan  
bû li ser nerazîbûna wê li ser wê paşeroja ko şûkirineka weha wê  
pêrgî wê  
dike. Carna jî, Şêroyî digote xwe; dibe ko hê dayika min ne çûbe  
Mûsilê  
cem wan û lewma jî bersiv ji cem wê ne hatiye. Û digote xwe; eger  
hê wê  
axiftina xwe digel çî kesekî ne gotibe û bi min û vê jiyana min razî  
bibe,  
ez dê her di cih de xazgîniyan bişînim mala wê û dê zû daweta xwe  
bikim.  
Şêroyî hizra hindê jî fikir ko dergehekê jiyane biquate bona ko pê  
bikaribe wê nûmala xwe pê rabigre û kirîn û firotina pertal û kincan  
hate

ber hizra wî. Wî di nav xwe de pilanek danî ko çend pereyî ji kesekê niyas

û pêçêbûyî qer bike û pê dest bi wî karî bike û di ber re jî arîkariya pêşmergeyan di bersîngirtina êrişên dagîrkeran de bike.

Çend rojekên din bi ser ve çûn û dayika wî hate seredana wî. Dayik, wê

carê ne weko carên din bi dîtina wî ya kêfxweş bû, Şêroyî weha fêm kir.

Li dema ko Şêroyî berê axiftinê pê re wergerandî bo ser pirsaxwe û Nazenînê, yekser û bi yekcarî xulkê dayika wî têkçû û çav lê sorbûn û kiz-

giryokê hefka wê girt û berda girî. Di wê gavê de dinya li ber çavên Şêroyî

tarîbû û çirîseyê serê wî girt û bi dengê lerizî ji dayika xwe pirsî:

— Te xêr e dayê!? Çima tu digirî? ew çi xulî ye bi serê me werbûye, ka

93

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ji min re bibêje?

— Kurê min, serbarê min, Nazenîn nemaye, Nazenîn miriye, ev xebra dayikê di girî û rondikên wê de têkel bûbû.

Wê gavê, te digot qey destekê hesinî dilê wî girt û givaşt û ji sîngê wî anî

derê.

— Mir!? bi tingijîn ji dayika xwe pirsî. Kî mir? Nazenîn!? Eve tu çi dibêjî, ma tu dînbûyî? Nazenîn mir?! Çima? Çawa?

Di gel van peyvên xwe kete di nav xirîqêneka girî ya xendiqê de.

Dayika

wî ew bi girî û rondikên wî ve himbêz kir û di ber wê semfoniya

xemgîn

ya girî û hinavsotina xwe herduwan de, ew, ya ko qewimî ji kurê

xwe re

vegêra:

— Li kûlana pişt mala wan çend Misriyekan tenûrxaneyeka nanî

vekiribû. Tenûrxane gelek nêzîkî mala wan bû, lewma Nazenîn, her

roj

spêdeyê zû, diçû wê tenûrxaneyê û nanê gerim ji wê derê dikiî.

Spêdeyekê, ji her roj zûtir, Nazenîn çû nanî û nezivirî ve. Hindî dayik

û

bab û kes û kar lê geriyar lê bi ser hilnebûn û çî jê nezanî. Dûre, piştî

çend

rojekan, polîs bi ser rastiyê hilbû. Dema wê spêdeyê Nazenîn çûye

nanî

hê zû bû, ji bilî wê çî kesekê dîtir li wir nebû, bes du nanevanên Misrî

li

wê derê bûn. Wan agirê tenûrê xweş dikir û hevîr dikire girik.

Zivistan bû û li derveyî tenûrxaneyê baran dibarî û sar bû. Wan

herdu

Misriyan ew bangî hundurê tenûrxaneyê kir bona ko xwe gerim

bike

heta nanî li tenûrê didin. Nazenîn jî li ber baranê terbûbû û ji dilekê

sax

guhdariya wan kir û kete hundurê tenûrxaneyê. ko pêyên wê ketine

nav

tenûrxaneyê de, her derhal, yek ji wan nanevanan destên wê digire  
û yê  
din bi pateyekî devî lê digire bona ko deng ji ber dernekeve. Zû û hê  
kes  
li wê derê xuyanebûyî, yekî ji wan dergehên firnê, xepengên wê ,  
anîn  
xwarê û ji nav de girtin. Herdu tadariyê li Nazenînê dikin û piştî wan  
xwe  
pê rehet kirî, wan nizanibû çî lê bikin û wan ne dixwest wê berela  
bikin  
jî, ji tirsî neku ya wan kirî ji devê wê derbikeve. Evca, bona ko ew  
xwe ji  
wê xelas bikin, radibin wê dikujin û bona ko ew xwe ji kelexê wê  
xelas  
bikin, wê dihavêjin di tenûreka agirê wê baş şaryayî de.  
Piştî gelek vekolîn û peyçûnan, gumana polîsî kete ser tenûrxaneyê  
û  
Misriyan. Ji gotinên cîranan xuyabû ko tenûrxane ji hemû rojan  
derengtir hatibû vekirin. Diyarbû ko ew mijûlî kelexê wê yê sotandî  
bûn  
û ji tenûrê derxist û xiste di nav gînîkekê de û bir û li çolê hişt. Polîsî  
qede-  
ka pateyî ji fîstanê wê û çend qupçikek ko ji fîstanê wê ketibûn di  
tenûrx-  
eneyê de dîtin. Dayika Nazenînê ew qeda pateyî û qupçikên polîsî  
nîşa

94 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

wê dayîn yekser nas kirin û weha polîs piştrast bû ko wan Misriyan ew kar

kiriye û ew girtin û paşî kelexê wê yê li çolê avêtî di gînikî de jî dît.

Eva Şêroyî guh lê bûyî, cîhan li ber çavên wî serêk û binêk kir. Wê rojê

ji biçûkan xerabtir berda girî û rondikên xwe bi merdî rijandin.

Xeyidîn

û tingijîna wî ya bê sinûr bû, her tiştêkê ko dihate ber devî digot »de were

tadariya be'isiyan bi xwe ji mer re bes ne bû, rabûn Misrî anîn û berdane

can û giyanê me, ma ew hatine vir ji bona pariyekê nanî û pereyî yan ji

bona ko destdirêjkarî û tadariyan bikin.!?» Şêroyî soz da xwe ko piştî

Nazenînê jin lê heram bin. Êdî Bêwarî û Nermînê jî qala jinanînê li cem

wî nekir bona ko birîna wî kûrtir lê nebe.

Piştî çend rojekan û ji bona ko xwe ji bîr vebike, Şêro ji gundê

Kanîmezîne diçe Kanîbelavê ji bo seredana hevalên xwe Newzad û Rêberî.

Herdu ji Bamernê bûn û xizmên dayika wî bûn û hevaltiya wî bi

wan re qayim û xweş bû. Newzad û Rêber ji leşkerê Iraqê reviyabûn û li

Kanîbelavê akincîbûbûn û wan di bergiriya millî de kar dikir. Herdu hevalan, Şêro di nava gundî de û li dewr û berên gundî gêrand û çûn cem

cem

hevaline din jî. Êvarê dereng Newzadî û Rêberî odeya xwe ji wî re  
hişt û  
ew bi xwe çûn mizgeftê, ji ber ko wê şevê nobeya wan bû di  
bergiriyaya mil-  
lî de û bingehê vecemyan û raketina nobedaran mizgeft bû.  
Şêro jî kete ber kapkê radyoyê û guhdariya nûçe û deng û basan û  
pro-  
gramên cur bi cur yê çend êzgeyan kir. Bûbû dereng û xewê xwe  
di  
çavên wî de wer fikir dema ko dergeh vebûyî û Rêber bi elemtirîka  
xwe  
ve xuyabûyî û piştî bi jorkeftî kesekê din jî piştî wî hate jor.  
— Eve Mehemed e, îşev mêvanê me ye, Rêberî mêvan bi Şêroyê ko  
di-  
gel dengê dergehvebûnê rûniştî ser cihê xwe, da nasandin. Îro ji  
Duhokê  
hatiye, ji serbaziye fîlarbûye û dixwaze bibe pêşmerge. Mizgeft ya  
tijî ye û  
cih tê de tune. Bila ev şeve mêvanê me be û em wî subehî bi rê  
dikin  
komîteya deverê.  
Piştî Rêber çû, Şêro çendekê bi mêvanî re peyivî û paşî herdu  
raketin  
ser cihên xwe û nivistin. Di wextekî de Şêroyî ageh ji xwe hebû, her  
weçku dengê hatê. Serê xwe bilind kir û guhên xwe baş veçinîn,  
dibîne  
ko deng ji mêvanî tê. Xuya bû ko kabra ji ber xew diaxift. Lê tiştê  
Şêro

mendehoşkirî ew axiftina mêvanî bi xwe û dubarekirina wî bo eynî  
axift-

inê bû. Axiftina wî gelek bi hev re girêdayî bû. Wî di axiftina xwe de  
qala

tişteke pir nihînî dikir; wî digot:

— Belê, divêt ez subehî biçim komîteya deverê. Roja pêncşembî  
biçim

bo bin cadeyê, wî çekî û lasilkiya di bin axê de veşartî bînim derê.

Ez, di-

95

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

vêt vê pilanê, her weko hatiye danan, bi cî bînim. Hêriş jî wisa bête  
kirin

ko kes pê nizanibe ko ez pê re me. Belê, karê min ew e ez şerî di nav  
pêşmergeyan bi xwe de, di deverên bin kontrola wan de, peyda  
bikim.

Karê min ew e baweriya xelkê bi pêşmergeyan sist bikim û wan li  
ber

yekudu bikim dijmin û neyar. Divêt, ew kes bi cilên pêşmergeyan  
biçin

telba wan kesan bona ko guneha kuştina wan bikeve di stuyê  
pêşmergeyan de û dê bes bi wî rengî pilana ji min re hatiye çêkirin  
hête

bicîanîn.

Heta berê spêdeyê xew bi çavên Şêroyî nekeft. Hêştî dinya baş zelal  
nebûyî Şêro ji nav ciha rabû û karê xwe kir û agir, di kuçkê li ber derî  
de

xweş kir û paşî çaydankê avê deyna ser. Guhdariya radyoyê kir û  
tovê çayê  
xiste di nav ava kelyayî de, çaydank ji ser agirî rakir û danî nêzîkî  
pelan  
bona ko hêdî hêdî, li ser xwe, bimixmixe û demê xwe bigire. Di wan  
delîveyan de Newzad û Rêber jî vegeyriyan mal. Berî ko ew mêvanî  
ji xew  
rabikin bona ko pevra sertêştê bixwin, Şêroyî ew herdu birin bo pişt  
malê  
ko dengê wan neçe mêvanî eger ne yê nivistî be û ya wî bi şev ji  
devê mê-  
vanê nivistî bihîstî ji wan re got. Lê herduyan got Şêroyî ko ev ne  
tiştêkê  
li ber aqil e ko rast be û wan gotê ko mirovine wilo hene ko ji ber  
xew di-  
axivin û ew nayê wê maneyê ko ew axiftin û gotinên wan rast in û  
nabe  
mirov pê bawer bike. Şêroyî ev şirovekirina wan ne pejirand û gote  
wan  
ko ew bawer nake ko ev kese yê vala û paqij be û her serek di bin vî  
kumî  
de ye. Lê ji ber dakokîliserkirina Şêroyî, hersê li ser hindê pêkhatin  
ko ji  
mêvanî re qala axiftina wî ya ji berxewê nekin û piştî ko Şêro çayê û  
têştê  
bixwe û berî ko mêvan bi rê bikeve, Şêro yekser biçe komîteya  
deverê û  
digel birêveberên komîteyê li ser vê pirsê biaxive.



Yên li komîteyê jî bawer jê nekir û gotinên wî bi tişteke ji çêkirina endêşeyî zanîn. Xwe, piştî ko wan navê wî kesî û ka şiklê wî yê çawa ye ji

Şêroyî bihîstê, yekî ji endamên komîteya birêveber got:

— Ez bawer dikim dê ew Mehemed be; endamê rêxistineka me ya ni-

hînî li bajarê Mûsilê.

Şêro bi wê gotinê yekcar tore bû û bi komîteyê re bi cirre çû. Serokê komîteyê gote Şêroyî:

— Tu, hindî pirtûk û çîrokan dixwînî, evca li cem te, jiyana rastîn digel xewn û fantasiya di wan pirtûkan de tevlihevbûye.

Şêroyî xatra xwe ji wan xwest û ji odeya komîteya kargêr derkeft, lê ne

çû, xwe ligel pêşmergeyên komîteyê mijul kir, li benda ko ew kabra bihêt

û bizanibe ka dê reftara komîteyê digel wî çi be.

96 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Piştî çendekê Mehemed hat û digel pêşmergeyekî axift, pêşmerge kete

hundurê odeya komîteya kargêr û piştî ew derkeftî, wî tişteke gote Mehemedî û Mehemed çû bo nav odeya komîteya kargêr. Ew demeka

xweş ma di wê odayê de, paşî ew û berpirsyarê beşê rêxistinê derkeftin û

wan pevra piyase kir.

Piyaseya wan gelek ne vekêşa, ji ber ko balafirên iraqî hatin hindav baregehê komîteyê û bombeyên xwe bi ser wan de berdan. Cihê

komîteyê pir asê bû, geliyekê kûr û dewr û berên wî çiyayên bilind  
bûn,  
ji ber hindê jî çî ziyan negehiştin çî kesekî di hundurê baregayî de.  
Piştî  
balafir çûn, pêşmerge xuyabûn ve û ew topbarankirin li cem wan  
tiştêkê  
normal bû. Serê Mehemedî jî diyarbû ve, ji veşargehê derkeft.  
Veşargeh hatibûn çêkrin lê çî pêşmergeyan xwe tê de nediveşart,  
hinekan ji mêrxasiya xwe, xwe ndiveşart û hinekan jî ji şerma  
hevûdu.  
Şêroyî viya xwe nêzîkî wî bike bona ko jê bizanibe ka wî çî li ber e  
bike û  
dê li kûderê şeva xwe derbas bike, Lê, Şêro yê pişt rast bû ko  
komîteyê jê  
re qala ji berxew axiftina wî kiriye û bê guman heke wan ew jê re  
kiribe,  
ew dizane ko Şêroyî ew xeber gihandiye guhên komîteyê. Lewma  
Şêroyî  
xwe nêzîkî wî nekir, lê xwe li ber wî û livînên wî vena. Piştî bîstekê  
pêşmergeyekî ew kabira da digel xwe û çûn bo nav gundê »S« û  
qesta mala  
xaleta Miryem kir.  
Şêro li pey wan bû û ew weha li pişt wan diçû ko ew wî nebînin.  
Şêroyî  
dostîniyeka pir qayim digel xaleta Miryem û mêrê wê hebû û wan  
gelek  
hez ji Şêroyî dikir. Xaleta Miryem ne bes di gundê xwe de, lê di nav  
hemû

pêşmergeyên deverê û di deverê de naskirî bû û malbat ne bi navê  
mêrê

wê, lê bi navê wê dihat nasîn. Heta kurê wê jî; bi kurê Miryema Îboyî  
di-

hat naskirin. Dibe ew jî ji hindê hatibû ko xaleta Miryem jineka bi  
cerg

û zîrek û dilovan bû û di mala xwe de û di mêvandariyê de pir merd  
bû û

jineka têgehiştî û xwedî gotina xwe bû û sedema ji hemûyan jî  
mezntir ew

bû ko wê, xwe ji zilaman kêmtir nedidît û di welatparêziya xwe de  
bi qasî

deh zilaman xizmet dikir.

Demekê dirêj pêve ne çû û xaleta Miryem hate derê, bona ko  
çaydankê

avê dabine ser agirê di kuçkî de û çayê ji mêvanan re çê bike. Şêroyî  
xwe

zû vê re gihand û piştî silav û pirsyara saxî û silametiya hevudu  
Şêroyî

gotê:

— Xalet, evro karekê min bi te heye lê nizanim ka tu dê çawa  
arîkariya

min bikî.

— De ka kurê xaletê bibêje ka ew çi xilmet e, heke ji dest min bêt  
wey

97

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

li ser kulovanka serê xaletê.

Şêroyî jî mesele ji serî heta binî ji xaletê re got. Xalet bêhnekê ma bê

deng, qey hizra xwe di wê çîroka Şêroyî de dikir û paşî ji nişkan ve got:

— Şêroyê delal, te ya rast bivêt, divêt mirov zû baweriya xwe nede mirovekê weha, heta mirov bi ser rastiya wî hilnebe. Tu xemê jê nexwe,

hindî ew li gundê me be, dê bi rêya jin û zarokên gundî, hemû livîn û

hatin û çûn û axiftinên wî bigehin min, ko tişteke bi guman tê de be, ez

dê zû nûçeyekê bigehînim te, lê tu van rojan li Kanîmezinê be, bona ko

ez bikaribim, di wextê pêwîst de, peywendiyê bi te re dabinim. Di barege-

hê pêşmergeyan jî de, dê neviyê min Semed, zêrevaniyê lê bike û dê

nûçeyan li ser wî, ji wê derê jî bigehîne min. Weha baş e, bi dilê te ye?

— Her ji me re sax û jîdirêj bî, Şêroyî weha spasiya wê kir.

Ew roj duşembî bû ko kabra hatibû komîteyê û heta roja pêncşembî çî

tişteke weha ne kir ko bibe cihê gumanê. Roja pêncşembî û ji ber ko Şêro,

hew dikarî xwe bigire, ew bi xwe hate baregehê komîteyê, bona ko ji

nêzîk ve zîrevaniyê li wî Mehemedî bike. Wî Mehemedî, di wê şevê de,  
ko li cem Şêroyî jiberxew axiftibû, gotibû ko dê di roja pêncşembî de  
tiştêkî bike û ew li bîra Şêroyî bû û lewma jî, ew wê rojê, bi xwe hat  
wê  
derê û xwest bi xwe kontrola wî bike.  
Bû nîvro û Mehemed ji baregehê ne derkeft, Şêroyî gote xwe »dibe  
ko  
êvareka dereng ji baregehê der bikeve, bona ko çaxê ko diçe bo bin  
ce-  
hdeyê, kes wî nebîne ». Lê êvara dereng hat û şeva tarî jî xwe da dû  
û kabra  
ji wî baregehê ne derkeft û bi çî rexan ve ne çû. Hemca, Şêroyî xwe  
bi  
hindê qayil kir ko dibe bi şev dereng xwe ji baregehê vebidize, yan jî  
wî pi-  
laneka din hebe, yan plana wî hatibe guhertin, lewma ew nenivist  
û  
hemû şevê ma hişyar û çavên wî li wê odayê bûn ya ko ew  
Mehemed tê  
de bû. Lê Mehemed nederket û têr nivist. Ew li dûrî pêşmergeyan,  
li ci-  
hekê, hebekê veder nivist, bona ko eger jiberxew axift çî kesêkî guh  
li  
axiftina wî nebe. Çunkî wî pirsê Şêroyî û bihîstina wî bo jiberxew  
axiftina wî zanîbû û ew ji hingê were li xwe agadar bû û bi taybetî  
di çax

û cihê nivistinê de ko bi çî kesekî re, di yek odayê de nenive.  
Dema Şêroyî dîtî ko kabrayî. li gor wê axiftina xwe ya jiberxewê kirî  
nekir, ew sist û xav bû û gote xwe »dibe ko ew axiftina wî, hema bi  
rastî,  
jiberxewaxiftin be û bes û çî ser dibin wî kumî de nebin«. Evca, wî  
biryar  
da ko dev ji zêrevanîkirina wî kesî ber bide û bizivire ve Kanîmezinê.  
Ew di rêya vegeerê de, berî ko ji gundî derbikeve, hevrûşî xaleta  
Miryem  
bû û piştî ko wê dîtî ko ew naxwaze zêdetir li pey wî kesî biçê, wê  
ew  
98 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

lêvekir û gotê:

— Dibe ko wî zanîbe yan gumana wî çûye ser hindê ko tu li dûf wî  
yî  
û dixwazî rastiya wê jiberxewaxiftina wî bizanî û ji ber hindê biryara  
xwe  
daye ko rojê biguhere û li şûna pêncşembî bike eynî. Evca te xwe  
heta ni-  
ha girtiye, xwe evro jî li ber vene, ka dê çî jê derbikeve.  
Gotina xaletê bi mejiyê wî ve nûsiya, evca wî xwe da rexekî, li hindav  
rêyê, li benda kabrayî, ka dê kengî der bikeve, da ew bikeve pey û  
bizanibe  
ka dê çî bike. Xaleta Miryem çû mal, nanek û hinek penîr di nav de,  
jê re  
anî û ew li wê derê bi tenê hişt.

Bû êvar û Şêro pir bêzar bû û ji bê hêvîbûnê rabû ser pêyan û xwest  
biçe  
mala xaleta Miryem bona ko tişteki bixwe, lê careka din xwe nizim  
kir û  
xwe da pişt darekê, dema çavên wî ji nişkan ve bi wî Mehemedî  
ketin ko  
ji bareghî der dikeve. Ew ji geliyî, ber bi xwarê dihat û yê bi lez bû.  
Şêroyî  
da dû wî, lê ne rê û rê, ji bona ko Mehemed pê nizanibe ko Şêro li  
pey wî  
ye. Heta ew gehîştine gundê Çimbilkê û di gundî de kabra li ber  
çavên  
Şêroyî berzebû. Şêroyî jî ne dixwest ew bi xwe lê bigere bona ko  
Mehemed wî nebîne. Lewma çû mala hevalekê xwe û ew heval  
hinarte  
nav gundî bona ko bizanibe ka ew kes di gundî de ye yan na û eger  
li  
gundî be ka li kîj malê ye û gote hevalê xwe ka ew kes yê çawa ye û  
çi kinc  
li ber in. Piştî nêzîkî nîv seetekê hevalê wî hat û gotê:  
— Kesek bi wî navî û wan navçav û bejin û cilkên ko te ji min re  
qalkirîn mêvanê Ahmoyê Keçel e.  
Bi wê nûçeya hevalî Şêro ji hindê pişt rast bû ko kabrayî li ber e  
tişteki  
xerab bike. Heke ma dê boçî ji hemûyan bibe mêvanê Ahmoyê  
Keçel, yê  
ko bi xwe cihê gumanê bû. Ew Ahmoyê Keçel yê ko hetanî berî  
salekê jî

rênîşanderê leşkerê Iraqê li deverê bû. Ew weko şehrezayekî, ko  
deverê, bi  
rê û gund û kunkunîşkên wê ve baş dinase, dikefte pêşiya hêzên  
dagîrker  
û ew di rêyên hêsan û veşartî de digehandin her ciyekê wan dixwest  
bige-  
hinê. Ew berî salekê hat deverê û xwe da dest pêşmergeyan û  
daxwaza  
lêborînê kir û wî xwe weko peşîmanekî anî pêş.  
Xwe, dibe kesekê xinizkar yan kesekê çewtî kirîn pûşman bibe û li  
xwe vebigere û çeperê dagîrkerî û dijminê milletî bihêle û xwe bide  
aliyê  
miletî û dev ji kar û kiryarên xwe yê xerab berbide, Şêroyî weha  
hizir  
kir. Lê bi ya şêroyî, ew kes jî, ji qesta ne hatiye deverê û her tiştêk  
di bin  
wî de ye. Her ji destpêka hatina wî Ahmoyî bo deverê, Şêroyî ew  
têbîniyên xwe gihandibûn berpîrsên pêşmergeyan li deverê. Li ser  
wî  
babetî û vekolîn û peyçûnên Şêroyî yê prîvat, di navbera Şêroyî û

99

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

hevalê wî de bû gêngaşe:

— Bes heval şêro, ez dibêjim ev ne karê te ye, lê karê van hêz û  
parta ne,



ko dever di destên wan de ye, wî hevalî ev têbîniya xwe xiste berdemê

Şêroyî.

— Pismam, ez di vî warî de bi te re me. Ew hêz û part berpirsyarên yekemîn in li hember her pirsekê li deverê, çi negativ û çi pozetîv be,

Şêroyî dîtina xwe diyar kir. Lê ev nabe egera hindê ko em bi hindê bes

bikin û çavên xwe li ser ya diqewime biniqînin. Bi dîtina min, berûvajî

wê, divêt her hevvelatîyek ji me, xwe bi berpirs bibîne û bi taybetî di

rewşa me ya evro de. Ev tiştekekê giştî ye, ez ji hestpêkirina xwe bi berpirsariya xwe ya nîştîmanî pê radibim. Ji ber ko xerabkarî di deverê

de ne bes part û hêzên wan yê çekdar pêrgî xeteran dike, lê me hemû

rûniştivanên deverê tûşî wan xeteran dike. Lewma ez nabînim ko ez

tiştekekê xerab dikim. Vajî wê, eger her kesek li cihê xwe, xwe bi berpirs

bibîne û xemê ji wê berpirsariya xwe ya nîştîmanî û millî û komelayetî

bixwe dê rewşa me sedcarkî çêtir bibe.

— De şêro, manê tu dê her xwe bi yê heqdar derxîni, bila bi ya te be.

Lê ez dibînim pêwîst e ko komîteya deverê pê bizanibe, çêtir e.

— Tu rast dibêjî, lê problem di hindê de ye, heke ew pê bizanin, ne di-  
hêlin ez pê rabim û ne jî ew tiştê dîkin, Şêroyê weha bersiv da. Wî  
xwest  
wî hevalî qayil bike ko tiştê ew dike ne karekê çewt e û eger başî tê  
de  
nebe, her xerabî tê de nîne, lê ya bi zehmet bû. Ew hevalekê wî yê  
nêzîk  
bû û guhdariya Şêroyî dîkir û mirovekê dilsax bû, lê pir sade bû jî.  
Şêroyî  
baş dizanî ew heval dê raportekê li ser wê livîna wî bide komîteya  
deverê  
ya parta xwe, lê hêviya Şêroyî ew bû ko ew karê xwe biqetîne hê wî  
ew  
nûçe negihandî komîteyê. Xaniyê Ahmoyê Keçel hinekê ji gundî  
veder  
bû, li hemberî derê wî xanî darmazî pir bûn. Şêroyî xwe di nav wan  
daran  
de, li hember derî mit kir, li benda wî Mehemedî, ka dê kengî der  
bikeve.  
şevê perdeya xwe bi ser gundî de dahêla û filfil kete qona diz û  
hîzan.  
Di gel taryatîyê deriyê xanî vebû, ronahiya elemtirîkekê di destekî  
de hate  
derê, Şêro ne yê dûr bû û zanî ko yê ronahî di destî de Mehemed  
bû û ke-  
sekê din jî derkeft, lê şêroyî nas nekir û paşî Ahmoyê Keçel jî hate  
derê.

Wan hersêyan da rê û ber bi cehdeyê çûn û Şêro kete pey wan.  
Pireka

biçûk, qesîseyek, di cehdeyê de hatibû çêkirin bona ko ew ava ji  
aliyê din

tê derbasî vî aliyê bibe. Hersê li ber wê pirê rawestiyan.

Şêroyî ew dîtîn, daçemyan û livlivîn û di tiştê de xebitîn. Li cem  
Şêroyî bû mereq bizanibe ka ew çi dikin, lewma xwe bi hêwaşî û bi  
dizîkî

### 100 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ve nêzîkî wan kir. Hewil da ji pişt wan darên ko wî xwe li pişt veşartî  
berê

xwe bide wan, lê hemca nikarî di wê taryatîyê de wan baş bibîne û  
bizane

ka ew çi dikin. Lê dengê wan baş hate guhên wî, ev suhbete dihate  
kirin:

— Ma min negot we, her weko wan gotiye min, eve ew hemû tişt,  
di

vê çalê de. Eve deh klaşînkof, bîst narincok, du arpîçî, yek dezgehê  
bêtel,

çwar debance û gulleyên wan.

— Panê divêt pîlan jî pê re be!

— Rawestin da em baş lêbigerhin, ha eve kaxezek.... hema ew bi  
xwe

ye... eve pîlan jî.

— Vêca em dê çi kin?

— Hêşt heşt kesên din jî mane, ew jî dê bihên û bigehin me. Subehî  
dê bigehin gundê Dehê û divêt ew duzba li vê derê bin.

— Bes hosa bi aşkirahî, heşt kes li gel yek bêne gundî dê me aşkira bikin.

— Yek, ew pevra nahên, lê dê kit kit yan cot cot bihên. Ya duwê jî, ew kes dê weko bazirganan bihên û dewar û tiştên firotinê jî bi wan re hene.

Em, her duzba ko ew gehiştin, dê bi kiryara xwe rabin. Ew, roja dîtirê bi roj, dê mijûlî kirîn û firotinê bibin û weha gumana çî keskî nakeve ser wan.

— Baş e, te pere ji bo me bi xwe re anî ne?

— Bêguman û çek jî, we çend bivêd dê bigehe dest we û hema di navbera me de bimîne, hûn dişên hinekê ji çekî jî ji xwe re bifiroşin û hindî em ji hukümetê bixwazin ew dê ji me re bişînin, lê eger hûn çekî bifiroşin, divê hûn bifiroşin wan kes û terefên ko li dijî van hêzên mezin in.

— Baş e, em nuke çî li vî çekî bikin û em kengî ji vê derê derxînin?

— Em dê subehî hên û çekî bibin gova dewarên min.

Ahmoyê Keçel axiftina dûmahiyê kir û çavên Şêroyî vêketin ko ew ji ci-hê xwe livîn û ber bi wî hatin. Wî xwe da aliyekî û xwe veşart. Berê wan kete gundî. Şêroyî xwe hinekê girt heta dîtî ko ew ji wî cihî dûr ketin, ji

nû, ew ji cihê xwe livî û ber bi wî cihê çû, yê ko ew lê rawestiyabûn  
û suh-  
beta xwe lê dikir. Şêroyî di wê tariyê de çavên xwe li wê derê  
gerandin,  
berê xwe dideyê, berekê mezin li ser axekê ye, ko nû hatiye radan.  
Ber da  
rexekî û ax hilkola, darekê pehin hate ber, wî ew dar rakir, ji bin darî  
ve  
ew heşameta çekî kete ber çavên wî. Şêroyî ji çavên xwe bawer  
nekir.  
Yekser hizrek kete serê wî. Careka din dar xiste ve ser çekî û bi axê  
nixafte  
ve û ber wergerande ve ser wê axê û berê pêyên xwe da gundê Çem  
Seyda.

101

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Her zû Bêwar ji malê anî derê û bi ya dîtî û guhlêbûyî agadar kir. Her  
di  
eynî gavê de, herduwan, du dewar bi xwe re anîn û hatin wî cihê  
çek lê  
veşartî. Çek ji wê çalê anîn derê û xistine di nav cihalan de û hildane  
ser  
pişta wan dewaran. Çal jî weko berê nixafte ve, lê berî ko axê  
rabineneve  
ser, Şêroyî berekê mezin xiste di çalê de û sê narincok bi wî berî ve  
girê-

dan û xelekên wan wesa bi darê ji ser ve girêdan ko hema dar ji ser bête

kişandin, ew xelekên narincokan biveresin û her sê narincok biteqin.

Wan ax rada ve ser wî darî û ew ber danî ve ser û çekê xwe di wê şevê de

anî Çemseyda. Çek di odeya qûtî, di xaniyê Bêwarî de veşart.

Roja din, êvarî, herdu ji mal derkeftin û wan berê xwe da wî cihê ko çek

jê anîbû bona ko bizanibin ka ew xwediyên çekê dê çi bikin. Berî ko ew ji

gundî der bikevin, hevalê wan yê caran, Segvan xuyabû. Piştî ko çûne ser

û stuyê hevudu û piştî silav û pirs û pirsyaran, diyarbû ko Segvan hatibû

bona ko wan bi xwe re bibe daweta xwe. Piştî çend deqîqeyekan Şêroyî

gote Segvanî:

— Erê Segvan tu mandî yan te pêwîstî bi bêhivedanê nîne?

— Ez û mandîbûn, Segvanî got. Bes ji bo çi tu vê pirsyarê dikî?

— Eger tu xîret bikî tu jî digel me were heta bin cehdeyê, Şêroyê pêşni-

yar kir.

— Xêr e çi heye?! Segvanî bi mendehoşî pirsyar kir.

— Ez dê bi rê ve ji te re bibêjim, Şêroyî got. Pêwîstiya me bi te heye, bona ko tu jî bibî bîner li ser rastiyeke

Wî bi rêve hemû mesele ji serî heta binî ji Segvanî re got. Hersê çûn û

xwe li cihekê nepenî, li ser rêyê, li ber wê destekê vena. Êvarî dereng du

kes xuyabûn, hatin û di ber cihê wan yê nepenî re derbasbûn. Şêroyî niyasîn; Mehemed û ew kesê din yê ko şeva berê pê re bû, lê Ahmoyê

Keçel ne bi wan re bû.

— De rabin, wext e em biçin û dizên xwe li ser devê çalê bigirin, Segvanî bi xwîngermî got, dema wî dîtî ew kes nêzêkî wî erdî bûn, yê ko

Şêroyî destê xwe dirêjkiriyê.

— Nexêr, bila ew û şansa xwe bin ka dê çi ji çalê înin derê, Şêroyî we-

ha got û mêzekire Bêwarî.

Hê Şêroyî axiftina xwe bi dawî neanî û di wê gavê de ko herdu kesan;

Mehemedî û yê pê re dixwest depê li ser devê çalê rabikin, dengê pe-

qînekê hat, ji tirsê, hêstirên herduyan teqiyên û paşî dengê nalenalekê ji

hêla wê çalê ve hat û dûre mitî û bê dengî.

Segvanî ev hemû fêhim nekir ji ber ko wî nizanibû ka Şêroyî çi kiriye,

102 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

lewma pirsyar kir:

— Eve çi bû?

— Bira ez negehiştim ji te re qala kiryara xwe ya duhî bikim, Şêroyê xwest pirsê li ber Segvanî ronî bike. Min û Bêwarî şivêdî çal valakiriyê û

me çekê tê de bar kiriye û di mala Bêwarî de hilgirtiye. Û me sê narincok  
bi depê ser devê çalê de asêkiribûn, bi awayekê weha ko digel rakirina wî  
depî ji ser devê çalê, xelekên wan narincokan jê biveresin û narincok  
bipeqin. Eve pişka yekê ji pilana me bicî hat û bila kelexên wan herduyan  
li cihê xwe bin heta spêdeyê serbazên iraqî tîn û wan dibin. Niha rabin  
da em biçin Ahmoyê Keçel bigirin û wî û çekên me şivêdî birîn bibin  
û  
bidin dest komîteya deverê.  
Li wî çaxê ew ji cihê xwe livîn bona ko biçin bo gundê Çimbilkê pêjnek  
hate guhên wan. Wan careka din xwe di cihê xwe de veşart, ew seh dik-  
inê ko Ahmoyê Keçel e. Segvanî xwe peyt kir bona ko biçeyê û wî bigire  
lê Şêroyî ew kêşa ve cem xwe û gotê:  
— Xwe bigire bila ew biçê ser çalê û bila bizanibe ka çi qewimiye.  
Ahmo nêzîkî çalê bû û gelek pêve neçû, bêhin maliqbûyî û pir tirsîyayî  
vegeriya û hê du sê pêngav nehavêtîn grupeka çekdaran li ber xuyabû û lê  
kire qêrî:  
— Raweste û ji cihê xwe nelive heke me tu kuştî.



Şêro bi hevalên xwe ve man hêbetî û xwestin bizanin ka ew çi çekdar in.

Wan xwe pîçek ji cihê xwe livand bona ko bikaribin wê grupê nas bikin,

lê wan hind xwe dît bi çekdarine din dormandorkirî ne, Şêroyî zanî ew

pêşmerge ne, ji ber ko ew nas kirin û endamekî komîteya birêveber ya de-

verê jî bi wan re dît.

— Eve çi ye?! Şêroyî pirsyar ji wî endamê komîteya deverê kir. We ji

kûve zanî ko em li vir in?

— Hema her ji wê gava te ji me re qala wî Mehemedî kirî û heta niha

tu li bin kontrola pêşmergeyan de bûyî, endamê komîteya deverê bersiv

da.

— Boçî ez li jêr kontrolê bûm û ne ew? Şêroyî pirsyar kir.

— Çunkî me zanî tu dê her li pey wî kevî û dê her bi ser rastiya wî kabrayî hîlbî û bi xêra te karê me jî hêsantir lêhat, endamê komîteyê peyivî. Lê me nezanî ko te narincok bi depê ser devê çalê ve asêkiribûn

heta me guh li peqînê bûyî û me guh li te bûyî tu ji Segvanî re qala wan

dikî. Heke me zanîba tu dê weha bikî, me wesa qebûl nedikir, ji ber ko te

hem kuştin kir û hem jî te du kes ji dest me kirin, ko dibe me zanyarîne

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

giring li ser peywendî û livînên wan li deverê ji wan standibana.

— Ya kuştinê, min ew ne kuştine û wan bi xwe, xwe kuşt û ew bi xwe

kujek bûn, Şêroyî berevanî ji xwe kir. Wan li ber bû bi awayekê pilanekirî

kuştinê bikin, ya zanyariyan jî, ew Ahmoyê Keçel di dest we de ye û eger

hûn bixwazin hûn dikarin her zanyariyeka pêwîstiyeka we pê hebe ji wî

bistînin, ji ber ko bi dîtina min ew e serê wan li deverê, Şêroyî weha bere-

vanî ji xwe kir.

— Ya rast em jî wê dizanin, ji berku duhî xeber ji rêxistineka me ya ni-

hînî ji bajarê Duhokê gehiştê me ko Ahmoyê Keçel dest digel hukumetê

heye û sîxur gelek pûte didin wî.

Ew her wê şevê çûn mala Bêwarî û pêşmergeyan ew çek ji wir bir bo

komîteya deverê û roja paştir ew heşt kesên din jî ji aliyê komîteyê ve

hatin girtin. Şêro û Bêwar roja dîtirê bi Segvanî re çûn wî cihê mala wî lê,

bona ko beşdarî aheng û şehyana jinanîna wî bibin.

## 104 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

– 10–

Di wê dawiyê de Şêroyî senga xwe xistibû ve ser xwendinê;  
xwendina her  
pirtûkeka diket ber destê wî, zêdebarî kovar û rojname û belavokên  
bi  
kurdî û erebî yên bi dest dikeftin. Wî her wisa radyoyeka Filîps kirî  
û ji  
wê radyoyê guhdariya nûçe û deng û bas û programên cuda cuda  
yên î-  
formatîv kir. Wî, ji bilî êzgeyên partên kurdî, guhdariya BBC, Dengê  
Amerîka, Montîkarlo û radyoyine din dikir. Wî dixwest, ji bilî  
wergirti-  
na zanyariyên nû li ser babetên cuda cuda, bizanibe ka cîhan qala  
gelê  
Kurdistanê û pirsgirêka wî û ya bi serê wî dihêt dike yan na. Dixwest  
bizanibe ka dengê gelê wî yê perîşan digehe derve yan na, ka çawa  
cîhan  
temaşayî Kurdistanê û doza wê dike.  
Çaxê di nava wî de hizr û lênerîn û tişt diketine serêk û aviz dibûn û  
ne  
dikaî wan di nava xwe de bihêle hilgirtî, wî dest dida qelemê û ew  
berdi-  
dane ser kaxezan. Belê, hêzeka mezin ew neçar dikir ko binivîse, ko  
ya di  
mejî û serê xwe de bi nivîsandinê vala bike. Wî ji bilî bîr û bawer û  
lên-

erînên xwe yê taybetî li ser rûdan û bûyerên cur bi cur, her weha jî bûy-

er û carna jî dîmenên hûr ji devera rizgarkirî di defterên xwe de tomar

dikirin. Wî wê dawiyê ev nivîsî:

— »Di vê dawiyê de Bergiriya Millî bi hejmara xwe ji pêşmergeyan pitir lêhatiye. Piraniya Bergiriya Millî ew kes in yê ko nexwstine beşdarî

şerê Iraqê û Îranê bibin û her weha ew pêşmerge ne yê ko nexwestine

beşdarî şerê birakujiyê yan şerê xwekujiyê bibin. Xwe ez jî di Bergiriya

Millî de me.

Min duhî spêdeyê posteyek bire gundê (x). Tiştê ez li wî gundî veciniqandim ew rewş bû ya gund tê de. Gundî hemû li derê bûn; li kolan û serbanan. Xem û tirs li ser navçav û livînên wan perçivî bû û ev

axiftine bi ber guhên min ketin:

— Ax ji derdê birakujiyê.

— Tu dibêjî ew hevudu ne kujin?

— Ma ez çi bibêjim, hêvîdarim wê bê aqiliyê ne kin.

— Hey ho, hey ho, ma tu bo kê dibêjî?

105

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— Heke van dev ji vê hevrikatiya bê wec berdaba, heke wan ji bo xati-

ra miletî û azadî û tenahiya wî yekgirtiba, halê me ev ne dibû û em di vê

perîşaniyê de nediman û em jî da karin bi serbilindî bijîn.

— Herê herê, heke em yekbana, da rejîma Bexda û yê din jî bo me hên ser çokan.

— Xwe bab û kalan rast gotiye; eger kirmê darê ji darê nebe, çi cara ne-

mana darê nabe.

— Belê we ye û her ji dehmana mirovî agir berdibe mirovî.

Ji reng û ruxsar û rewş û axiftina gundiyan xuyabû ko tiştê qewimî bû,

yan li ber qewmînê bû, û diyar bû jî di mala Reşoyê Nalbend de tiştê

hebû ji berku çavên gişan li wê malê bûn, lewma min pirsyar kir ka ew çi

qewimiye:

— Şivêdî pêşmerge ser bi parta (n) li mala Nalbendî bûne mêvan û

berî çendekê jî pêşmerge ser bi parta (z) çûn mala Nalbendî.

— Pîrbêj mişe ne û diyar e kesekî xeber gihandiye wan, lê eve demekê

dirêj e herdu teref di hundur de ne û ne çi deng hatiye û ne jî kesek hatiye

derê.

— Ê hûn li vê derê rawestiyane li hêviya ko tişt biqewime û paşî bêjin;

de aha eve wan çi karekê xerab û pîs kir? min pirsyar ji komeka zilaman

kir.

— Ma çî ji dest me dihêt? Em dikarin çî bikin?

— Gelek ji dest we dihêt eger hûn bixwazin û xwe pîçekê bîsteh bikin.

Li şûna ko em li vê derê rabiwestin û li benda hindê bin ko tiştek biqewime, em dikarin biçin mala Nalbendî û bizanin ka rewş di hundurê

malê de çawa ye û eger ya xerab be û li ber peqînê be em bikevin navbera

wan û we nekin xwîn birije. Em dikarin ji wan bixwazin ko şerê hevudu

nekin, em dikarin xwe pavêjin ber pêyên wan û tikaya jê bikin ko hevudu

nekujin, belkî li ser xatira me çî ziyana negehînin yekudu. Eger wan bi vê

hemûyê jî nekir em dikarin êdî, hindî ew di şerê birakujiyê de bin, wan

di malên xwe de ne hewînin û alîkariya wan nekin û weha em wan neçar

dikin ko siyaseta xwe ya xelet biguhorin, heke millet bi wan re namîne.

Piştî vê gotina min, çend kesekan xwe da digel min û me berê xwe da

mala Nalbendî. Hê em nêzîkî malê nebûbûn û pêşmergeyên parta (z) ji

mala Nalbendî derkeftin û dêmên wan xemokî bûn. Ez keftim gumanê;

ev çima dêmxemokî ne? Pa nê dengê teqîna tivengan ne hatiye, tu dibêjî  
ko ew bi çeqokan ketibine giyanê hevûdu? Gundî jî di cihên xwe de man  
çandî û hêbetî.

## 106 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Berî ko pêşmergeyên parta (z) bêne gundî, wan zanîbû ko pêşmerge ne  
ji parya (n) di gundî de, li mala Nalbendî ne. Lewma wan xwe zûka, bi  
dizîkî ve, di rêya nav baxçeyan de gihande mala Nalbendî û dewr û berên  
xanî girtin. Hinekan ji xwecihên gundî çav bi hatin û wê livîna wan keft  
û xwestin tiştêkî bibêjin, lê wan pêşmergeyan bi îşaretine ji destên  
xwe ew têgihandin ko xwe dûr bêxin û mayê xwe di pirsê de nekin û qalşî  
wan nebin.  
Pêşmergeyên parta (z) xwestin bikevin hundurê xaniyê Nalbendî bona  
ko pêşmergeyên parta (n) bigirin, lê dengê axiftina ji hundur dihat weha  
kir ko sergêrê wan pêncan operasyona xwe rabiwestîne û li ber derî guh  
bide suhbeta di hundur de tê kirin bona ko bizanibe ka ew qala çi dikin.

Wî guh veçinîn ser suhbeta di nava xaniyê de dihate kirin û ev bihîst:

— Baş e ma eve durust e ya hûn herdu alî dikin? Ma heta kengê dê hûn

ji wan kujin û ew ji we kujin û dijmin jî ji we herduwan û ji me hemûyan?

— Kes nikare bibêje ev karekê baş e û bêguman ne di berjewendiya çî

aliyekê ji me de ye û her di xizmeta dijminê de ye.

— Bawer bike mam, heke niha bêne telba me û heta eger em bizanib-

in ko sed der sed ew dê me kujin jî, em desta nadin tivengên xwe û em

kuştinê ji wan nakin.

— Baş e, lê hûn kêma in û ew in li vê derê xudan hêz û heke ew yêna kuşt-

inê bin dê hûn çî bikin?

— Rast e, eger yê xwedî hêz û desthilatdar li dijî xwekujîya navxwe be,

hîngê hemû tişt hêsan dibin. Lê heta eger ew û em weko hêz, di vî warê

de, bi durustî ne xwedî helwêstekê xuya û baş bin jî, di nav herdu hêzan

de kesine hene weko me hizir dikin û li dijî birakujîyê radiwestin û yêna

weko we jî, roj bi roj di mişebûnê de ne. Ez bawer dikim eger serkêşên me

vî rengê şerê navxwe bixwazin jî, ew nikarin li ser berdewam bin, eger em,



weko millet li dijî bin.

— Nê çî cara hemû di hizirkirin û dîtinên xwe de weko yek nabin û bab

û kalên me ji kevin de gotine »her serek aqilek e« tu dibêjî sergêrên me vê

rastiyê nizanin yan hema xwe di ser de dibin û xwe xişîm dikin?

— Te ya rast bivêt mamo te li kakilka rastiyê da. Problem di hindê de

ye, mezinên me carna tiştine baş dibêjin lê ew qet li gora gotina xwe nakin

û eger bikin jî tişteke gelek kêr jê bi çî tînin. Mixabin ko me di vî warî

de dîrokeka dewlemend heye û şerê hevudukirin li Kurdistanê ji kevin de

heye û sedemeka serekî ya bîndestbûna me ye. Dijminên me jî hemû

hewla xwe didin bona ko ew rewş neyê guhertin, em jî ji wan re di wê

107

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

pirsê de arîkar in. Tiştê mirovî mendehoş dike ew e ko em û bi taybetî

serokên me vê rastiyê dizanin û her qala hindê dikin ko wan ders ji dîro-

ka gelê xwe standine û êdî we nakin ew karesat û çewtî û kêmanî dubare

bibin ve, lê ew peyvên wan dimînin peyv û dîrok bi şêweyekî ji şêweyan,

ne bes dubare dibe ve, lê sêbare û dehbare û sedbare dibe ve û xencera me

jî her li piştta me û li sînga me dikeve ve. Heke me ji gotinên xwe yê xweşik û baş ji sedê bîst bi cî anîbana, dibe ko îro rewşa me çêtir û xweştir

bibaya.

— Ya ji hemûyan jî nexweştir ew e ko ev di wextekî de diqewime, ko tê

de, rejîma faşîst ya Bexdayê, êrişekê ji bo vebirandina gelê me tîne ser

Kurdistanê.

— Eve kula dilê me hemûyan e û pirsyara me ya her tim bê bersiv e; ew

çima vê niha dikin? Ew çima niha xwe ji bo rizgrkirina welatê xwe û azad-

kirina milletê xwe nadine hev û bila paşî, piştî azadiyê û danîna dewleta

xwe mijûlî problem û aloziyên navxwe bibin? Evca hîngê millet kê dixwaze bila ew be, heke ew rast ji bo milletê û bi ya milletê dikin.

— Xalet ev gotina te zêr e û xwezî bibaya guhar û di guhên her xweci-

hekê Kurdistanê de baya.

Piştî vê gotinê deng hebekê hate vebirîn û di wan gavan de sergêrê pêşmergeyên parta (z) ferman da pêşmergeyên xwe ko biçin di hundurê

mala Nalbendî de. Dergeh hêl hate paldan û ew bi tivengên xwe yê

arasteyî yên di hundur de kirî ketine jor û sergêrî kire qêrî:

— Kes ji cihê xwe ne live!

Çiwar pêşmergeyên parta (n) û Reşoyê Nalbend û jina wî, xaleta Gulbuhar di jorê de bûn. Tivengên sêyan ji wan pêşmergeyan bi singan

ve hilawîstî bûn û ya yê din, ko bi sergêrê wan xuya dibû, bi rex wî ve, pal-

dayî dîwarî bû. Ne wî û ne jî hevalên wî destên xwe birine tivengên xwe.

Xaleta Gulbuhar têgehişt ka çî rû dide û zanî ewên nûhatîn ji parta (z) ko

li dijî parta ewên rûniştî ne. Wê xwest weneke tişteke xerab biqewime:

— Kurên xaletê, guhê xwe nedin xerabkaran û xwîna yekudu ne rêjin,

xaletê ev got û xwe avêt ber pêyên wan û bû lave lava wê.

Ji ber wî dîmenê xaleta Gulbuhar ya di navsal de çûyî û ya li ber wan ketiye ser çûkan û tika ji wan dike, herdu destek li ber xwe ketin û her-

duwan ji xwe şerim kir. Xaleta Gulbuhar ew pêşmerge bi çavan nas dikirin, çunku car û bar li cem wan dibûn mêvan û xaleta Gulbuhar bi

xwe jî di deverê de pir nas bû, ji ber ko jineka welatperwer û dilovan bû

û derê mala wê li ber pêşmergeyan her tim vekirî bû. Her pêşmergeyek,

108 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ko diçû mala wê û kesê wî li deverê nebû, wê cil û kincên wî dişûştin  
û

xwarinên xweş jî ji mêvanên xwe yê pêşmerge re çêdikirin û roj jî  
derbas

nedibû ko çend pêşmergeyek li mala wê nedibûn mêvan.

Sergêrê desteka parta (z) pir ji xwe şerim kir. Wî tivenga xwe bi milê  
xwe ve kir û destên xwe dane milên xaletê û tika jê kir ko ji ser çokan  
ra-

bibe. ko xalet rabû, wî maçî destê wê kir û gotê:

— Xalet te em şehmizar kirin. Eve te çî kir, te em gunehbar kirin.

Divêt

em li ber jineka weko te bikevin ser çokan. Xalet bawer bike me jî,  
dil li

ser wê çendê nîne, lê em çî li yê serî bikin? Wan ev ferman daye  
me û em

hinartine bona ko van biraderan bigirin.

— Xurtên delal, ma yê serî bi kê dikin? Nê her bi we dikin, xalet  
berdewam bû li ser axiftinê. Ma yê serî bê we çî ne û dikarin çî  
bikin?

Nê hema, heke hûn û yê weko we bo tiştên weha bi ya wan nekin,  
ma

dê ji kûve birakujî çêbibe?

Sergêrê pêşmergeyên parta (n) got xaletê:

— Wey ez sed carkî qurbanê te û van gotinên te yê zêrîn bibim,  
xalet.

Pêşmergeyên din jî, yê desteka parta (z), weko sergêrê xwe,  
luliyên

tivengên xwe şor kirin. Bi wê kiryara wan dilê xaletê hîn bû û  
bişkurînekê

cihê xwe li ser lêvên wê çêkir, ji kêfa de rondik ji çavên wê barîn.

Wê bi

lewendiyan xwe rondikên xwe vemaliştin û gote wan:

— De evca kurên xaletê yên delal, de rabin li ser xatira min herin  
dest

û stuyên yekudu, evroke hûn jî mêvanên me bin û xwarineka xweş  
pevre

bixwin.

Sergêrê pêşmergeyan ser bi parta (z) berê xwe da tirşika bi kifte ya  
li ber

mêvanan danayî û got:

— Xalet bi rastî em gelek ji tirşika te xerîb bûne û ev demekê dirêj  
e me

xwarineka weha xweş ne xwariye, lê me ferman heye ko zû  
vebigerin ve û

heke em zû neçin, ez ditirsim ew hizir bikin tiştêk bi serê me hatiye  
û paşî

pêşmergeyê din li hawara me bişînin û wê çaxê mirov nikare tiştêkî  
bike

û dê ji dest me der bikeve. Lê berî em biçin, xalet, ez dixwazim bêjim  
ko

van hevalan rast digot; em jî weko wan li dijî vî şerî ne û em hatibûn  
bo

girtina wan û qet di dilê me de nebû em kuştinê bikin û em qet jî  
nakin

û heta eger yên li serî jî, ji me bixawzin, peyman be em nekin.

Herdu alî çûne dest û stuyên hevûdu. Giriye kêfê hefikên wan girtin  
û

wan xatira xwe ji hevudu xwest. Li ber derî, sergêrê pêşmergeyên  
parta (z)

li pêşmergeyên parta din zivirî û gotê:

— Hevalno! Eger hûn hebekê zû ji gundî derbikevin çêtir e, neku  
109

### KURÊ ZINARÊ SERBILIND

mejîhişkek bi ser we de hilbibe û ew biqewime ya kes ji me hez jê  
neke.

Ew weha derkeftin û zû gund li pişt xwe hişt û berze bûn. Ez bi wan  
çend kesekan re ber bi mala Nalbendî çûm. Hê çend pêngavek  
mabûn

dema der vebû û pêşmergeyên parta din jî, sax û bi çekên xwe ve  
derkeftin. Li pey wan xalet jî hate derê û her weko wê dizanî ko  
gundî li

hêviya şirovekirinekê ne, got:

— Çi ne qewmiye û herdu teref çûne destên hevudu û her yek ji  
wan

diçe ser rêya xwe. Evê nûçeyê kenî anî ser dêmên gundiyan û  
axiftinên

dilveker ji her aliyekî ve derkeftin:

— Aha divêt hosa be.

— Xwezî hemûyan ho kiriba.

— Xwezî mezin û serokan zehrî wan kiriba.

— Dê rojek hêt, ew tê de neçar bibin ko guh bidin me yên li binî.

— Lê hema, ew roj dereng neyê û di wextê xwe de bihêt.

— Pûşmanî di nîva rêyê de jî baş e.  
— Xwezî û sed hezar cara xwezî wan dest dabana yekudu û bila min  
çi  
tişte li ser darê dinê nebaya.  
— Ma ew li benda çi ne, nê ha dijminî em jinavbirin û qutbir kirin.  
Dilxweşî û kamuraniyeka pir mezin kete nav xwecihên gundî û her  
ke-  
sekî ji wan, di wan gavan de, hest bi hindê fikir ko wî ji her carekê  
bêtir  
welat û milletê xwe divêt û ruha biraiyê di nav wan de gerim dibû.  
Bêguman dîtina xelkê me pir rast û di cihê xwe de ye û nemana şerê  
bi-  
rakujiyê ruha xweragirî û berxwedanê li cem xelkê me geştir û xurtir  
dike  
û roja xelasbûn û azadbûnê nêzîk dike.  
Li van deverên rizgarkirî kesine hene rexneyê digirin, lê pir kêmin  
yên  
ko rexneyê dikin û çewtî û çawaçareserkirina çewtiyan jî destnîşan  
dikin.  
Li vir hindê grup peydabûne, ew di piraniya xwe de ji fîlarbûyan  
pêkha-  
tine, ev grup rexneyan bi rengekê pir dijwar digirin û rexneyên wan  
di pi-  
raniya xwe de bi kerb û kîn in û xelkê deverê li dijî partên serekî  
teyar  
dikin. Carna jî pirsar kuştin û jinavbirina serkêşên pêşmergeyan tînin  
zi-  
man. Zimanê wan pir dirêj e, di markisî û lenînizmê de lewleban in,

mirovên bê ezmûn in û çî alternatîveka wan nîne û xuya ye ew bi axiftin

û rexnegirtinê xwe diyar dikin û xwe diînin pêş.

Tiştêkê pir baş e ko mirovên bi cerg û bisteh peyda bibin û bersînga çewtî û lengiyan û yên pê radibin bigirin û rêçareyên baştir dabinin ber

van partên desthilatdar yan bibin alternatîveka baştir û bi xêr û bêrtir, lê

mixabin rexnegirtina van grupan xeber û xwepîvan û gotinên kirêt û

## 110 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

keşefir in. Ez di destpêkê de, bi wan re ketim danûstandin û gêngaşe û

axiftinkirinan, lê ko min dît ko ew ji bilî ya di serê xwe de çî ya din qebûl

nakin, min xwe ji kêşmekêş û pîrbêjîyên wan dûrxist.

Tiştê gelek keyfa min pê dihêt xwendekar û mamosta ne. Mamostayên

deverê di piraniya xwe de bi rolekê welatparêz radibin û ruha welat-

parêziyê di xwendekaran de bihêz dixin. Hukumetê her ji sala 1977-ê

rewşa xwendekarên Kurdistanê xerab kiriye; yek, zimanê erebî kiriye zi-

manê xwendinê. Weha li ber xwendekaran tev li hev dike; car bi erebî,



car bi kurdî û careka din bi erebî, ji bilî ko xwendekarên kurd ji mafekê

wan yê neteweyî, ko xwendine bi zimanê xwe yê zikmakî, bê behir dike.

Dû, wê dest pê kiriye hinek dibistanan digire, bi bihaneya ko dûrî desthi-

lata wê ne û weha hejmara xwendingehan kê m dibe. Sê, hejmara mamosteyan jî kê m dike û her çendsed xwendenkarekan yek mamosteyê

xwe heye.

Li deverê ji xwendekaran re pir zehmet e bi erebî bixwînin, ji ber ko

erebiyê nizanin û weha di dersan de zîrek nabin û nikarin dahînanê tê de

bikin.

Weke nerazîbûn li ser nehiştina zimanê kurdî di dersan de, xwendekarên debistanan li gundên deverê biryar standin ko pirtûkên dersan

yên bi erebî bisojin. Mamoste di piraniyê de digel de bûn, lê hinek baban

asteng xistine di rêya mamosteyan de û ev karê sotina pirtûkan dixiste di

stuyê mamosteyan de. Wan baban dixwest ko zarokên wan bi erebî bixwînin, lê zarokan ne dixwest. Bes zarok neçar e bi ya babê bike.

Hêceta wan baban ew bû ko di zankoyan de, li Mûsil û li Bexdayê, xwendin bi erebî ye û eger zarokên wan bi kurdî bixwînin, ew wê çaxê

nikarin xwendinê li wan unîversîteyan bidomînin û ji ber hindê jî ew

dixwazin zarokên wan bi erebî bixwînin.

Lê piraniya xwendenkaran li dijî xwendina bi erebî bûn û wan pirtûkên

xwe hemû xwendenkaran bi hev re sotin. Pirtûk vedicemandin serêk,

weke girekî lê dihat û agir berdidanê û disotin. Wan dixwest, bi wî awayî,

bibêjin desthilatdarên Bexdayê ko wan divêt bi zimanê kurdî dersan bixwînin, ne ko bi zimanê erebî. Lê ma kengî Bexda di xema dîtî û hezkirina xwendenkar û miletî de ye!«

111

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

– 11 –

Êvariyeka rojeka havîna sala 1988-ê çend pêşmerge û çend sivîl li gundê

Bazê li bin keprekê rûniştibûn û guhdariya radyoyê û nûçeyan dikir. Hemûyan guh dida deng û basên wan hewildanên dihatinn kirin ji bo

rawestandina şerê Iraqê û Îranê û aşkirina herdu layenan:

— Wey xwezî me dîtiba ko ev şere jî rawestaba û êdî xelik nehatiba kuştin, ev Gencoyî ko berî çend mehekan ji berokên şerî li hember Îranê

reviyabû û hatibû deverên azadkirî û bûbû pêşmerge got.

Şeroiyî ne xwest destpêşxer be di bersivdanê de, lewma wî xwe li benda

keseke din girt ko komentarekê li ser gotina Gencoyî bibêje. Lê hemû bê-

deng mabûn û çavan hêv dikire çavan, Şêro nikarî bêdeng bimîne û  
xwest dîtina xwe bipeyivîne:

— Pismam tu şekirê dişkênî, mirov ger bi durustî mirov be û ji  
mirovan hez dike divêt li dijî şerî û teror û destdirêjkariyan be û ez  
di wê

bawerê de me ko çî kesek di nav me de nîne ko şer pê xweş be. Ez  
bi baw-

er im jî ko me gişan pê ne xweş e ko ev xelkê bêguneh di rêya van  
hukumet û rejîmên zordar de têne kuştin, lê ez nizanim ka bi dîtina  
te çî

wec û başiya me di rawestandina vî şerî de he ye, eger hukumdar  
her

hukumdarê caran be? Ev got û mêzekire Gencoyî, her weşku  
daxwaza

bersivdanê jê dikir.

Bi xwîn germî û mîna kesekê baweriyeka pir mezin bi gotina xwe  
heyî

Gencoyî welam lê vegerand:

— Ez dizanim mebesta te ji vê pirsyarê çî ye, lê rê bide min ez  
pirsyarê

ji te bikim ka me di van heşt salên vî şerî de çî wec ji şerê wan dîtiye?  
Li

şûna ko em wecê ji derfeta bi dest me keftî bibînin, part û rêxistinên  
me,

her ji Suleymaniyê bigire heta Zaxoyê, berbûbûn bersingên hevudu  
û xe-

bata wan ya serekî bûbû birakujî. Evca bi dîtina min eger ev şerê  
Iraqê û

Îranê rabiweste çêtir e û belkî xêreka me jî tê de hebe.

Bi dengekê nerim û li ser xwe Şêroyî dom da kêşmekêşê:

— Ya wec jê newergirtinê ez bi te re me, lê kêm tişt, baş e ko di vê dawiyê de û bi fişara milletî partên me dev ji şerê birakujiyê berdaye û

## 112 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

hewil didin ko di navbera xwe de xweş bikin û pîrensîpên karê hevbeş yê

nîştîmanî di navbera xwe de binecih bikin.

Şêroyî dixwest hê bipeyive li dema Gencoyî axiftin lê qut kirî:

— Piştî çi? Piştî karesata Helebçe û şehîdkirina Helebçe, piştî jidestxwekirina heşt salên şerê Iraqê û Îranê? Piştî xweêxistinê bo ber

destê Îranê û Iraqê û belavkirina bêzariyê di nav xelkê me de? Hevgirtina

çi? Hinek teref di vê yekgirtinê de hene eger hat û subehî bi hêzkeftin û

bîva xwe dît dê careka din berê luliyên tivengên xwe bidin ve yekudu û

dê rûpelên kevin vedin ve. Hemû jî bes bo pêşxistina partên xwe bi tenê

ye, ji pêxemetî hindê ye ko beyava li bin kontrola hêzên xwe mezintir

lêbikin û Kurdistanê bikin ve çend mîrgehek.

— Birawo ev yekgirtine çi be û çawa be û sedmên çêbûna wê çi bin jî

pêngaveka dîrokî ya pîroz e û cara yekem e di dîroka me ya nûjen  
de tişte-  
ka weha rû dide, Şêro li ser xwe diaxivî. Divêt tu ji bîr nekî ko eve  
daxwaza miletê me bû, lê ez tişteki bi te re me, ew jî ew e ko em bi  
vê pê-  
gavê bi tenê qayîl nebin û fişarê bêxin ser van partan bona ko ew  
ruha  
yekgirtinê û ruha karê hevbeş yê nîştîmanî di nav xwe de weko  
serkir-  
dayetî û weko rêxistin belav bikin û biçespînin. ko ew guhertinan di  
nav  
xwe de bikin bona ko bikaribin vê qonaxa nû fêhim bikin û li asta  
berpirsyariya xwe ya dîrokî bin. Karê me ew e, em vî şeweyê  
pêkhatinê bi-  
parêzin û mukumtir lêbikin û ber bi pêşde bibin. Nê her em bûn yên  
ko  
gazinde û gilî ji van partan dikirin û me çekên xwe dideynan û me  
dev ji  
pêşmergetiyê berdida, hemû ji bo diyarkirina nerazîbûna xwe li ser  
çewtiyên wan û bi taybetî li ser şerê birakujiyê û neyekgirtina wan.  
Ez di-  
gel te me ko van partan ne ji bawerî ev tiştê baş kiriye, lê ew ji tirsê  
hindê  
kir neku ji miletî dûr bikevin û wan ji bêgavîyê bawerî bi rastiyê anî  
û rêya  
mana xwe weko part di birakujîrawestandinê de û di hevgirtinê de  
dît.

Eve rast e, lê em çi bikin? Divêt em ji bîr nekin ko yekgirtina milletê me girêdayî yekgirtina part û hêzên wî yên siyasî ye û part û hêzên me jî ev in. Evca kêm tişt, heke ew berhingarî hevudu nebin û ji yekudu nekujin, wê çaxê, em dizanin ko em weko millet şerê hevudu nakin û ji hevudu nakujin. Her ji ber hindê jî divêt em pêngavên ji vî terzî, ji dil û can him- bêt bikin û ji dil hewil bidin wan bikn pîrensîp ji bo jiyana xwe di paşero- jê de.

— Ev axiftina te weha min têdîgehîne ko divêt em xwe di kevilê xwe de bend bikin û me dil bi van miletan ne be û me bes çav li milletê xwe û doza wî be, Gencoyî bi tingijîn xwe anî ve nav gêngaşeyê. Ma tu dizanî vî şerî

113

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

çi bi srê herdu milletên Îranî û Iraqî aniye, nê şerî ew herdu di nav agirê xwe de qelandine. Rawestandina şerî, ragirtina xwîna xelkê hejar û perîşan e, ragirtina xwîna mirovê Iraqî û Îranî ye.

— Birawo eve tu qala çi dikî, xwe tu jî baş dizanî ko milletê me digel vê

hemû perîşanî û bindestî û bêazadî û daplosîna tê de dijît, ji milletên  
dewr  
û berên xwe dilovantirîn e û ji wan re û ji bo xweşkirina jiyana wan  
û ji  
bo rehetiya wan her tim arîkar û hevkarê pêşîn bûye, Şêroyî hedar  
nema  
û bi xeyidîn li ber devê Gencoyî da. Ez li vê derê, dê perdeyê dirînim  
û dê  
xwe bisteh bikim û bêjim ko her xemsariyeka hebe jî, ew ji aliyê  
miletên  
cîran e, ne ji ba me ye. Ez dizanim kesine dê hebin ko min ji ber van  
goti-  
nan bi regezperist li qelem bidin, lê ev ne nifişperêsî ye, ev rastiye  
e û di-  
vêt ew millet wê baş nas bikin û bizanin çewtiya wan li kûderê ye û  
ka wan  
pê daye ser mafê kê. Bira, eger şerê Iraqê û Îranê berî heşt salan  
dest pê  
kiribe, şerê ko van dewletan bi ser milletê me de sepandî gelek û  
gelek ji  
wî kevintir e. Eve çend sal in em tên bindestkirin û kuştin û  
derbiderkirin  
û jinavbirin û me hê ji aliyê van milletên dirawsê ve çi piştevanî û  
arîkarî  
û hevkarî ne dîtiye. Evca çima tu qala vê nakî û boçî tu bizavê nakî  
vê  
rastiye bêxî ber çavên wan, ji bona ko ew xwe baş nas bikin û  
bizanibin

ka hukumetên wan, bi rêya wan, çi tadarî li miletê me kiriye. Nê  
bê-  
dengiya van miletan li ser zordariya ko hukumetên wan li gel û  
welatê me  
dikin, bi xwe zordarî ye.  
Her weçku Gencoyî dixwest berê axiftinê biguhore û bibe ser ya ko  
ji  
mêje dixwest bibêje û ya di dilê xwe de birêje, lewma qisekirina  
Şêroyî  
birî û got:  
— Li gor lênerîna min rawestandina şerê Iraqê û Îranê û aşbûna wan  
di  
çakiya bizava azadîxwaza Kurdistana Iraqê de ye.  
Şêro bi wê gotina Gencoyî vecininqî û yekser axiftin lê vebirî û bi vê  
gotina xwe berbû navçavên wî:  
— Te çi got? Çakiya me tê de ye! Ew çi çakî ye ji vê şerrawestandinê  
digihîje welat û gelê me? Eger mebesta te ew be ko digel  
şerrawsetandinê  
ev rejîma hukumdar jî nemîne û demokrasî cihê wê bigire ew rast  
e, eger  
mebesta te ew be ko kenkeneyên cîhanê mîna Amerîka û yên din  
piştî  
şerrawestandinê rêçareyekê ji pirsê me re payda bikin û we nekin  
êdî Iraq  
xwe taloqetî ax û welatê me bike ew jî rast e, lê eger mebesta te  
bes şer bi  
xwe be, ew dîtineka bilecîb e. Em jî li dijî şerî ne û her kesek ji  
hevalên



rûniştî jî li dijî şerî ye, lê tu divêt bizanibî çi çakiya milletê me di şerrawe-

standinê bi tenê de nîne, ji ber ko hema şer rawestiya, dê bînê ka dê çawa

#### 114 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Iraq berê leşkerê xwe bide Kurdistanê û dê çawa fermana me rabike.

— Eve we xêr e hûn wisa li çekî û şerî aşiq bûne, weko kesekî marî gestî

Gencoyî got. Xwe heta hetayê karê me çek û şer nabe.

— Hey çav lê korebin yê ji çekî û şerî û kuştinan hez dike, pêla dengê Şêroyî jî bilind dibû. Ev şerê em tê de, ne di dest me de ye û ev şere bi ser

me de hatiye sepandin. Yê şerê me dikin û me pal didin ko em şerî bikin

serdar in û xudan dewlet û hêz û çekê nûjen in û zimanê wan bes şer e û

bes zimanê hêzê û şerî fêm dikin û heta niha çi çareyeka din nebûye pê

bersiv li şerî bête dan. Em li ser axa xwe ne û ew bi çek û cebilxane û leşk-

erên xwe ketine nav axa me û hatine bona ko me bindest bikin û eger em

bi ya wan nekin û em nebin kole û beniyên wan, ew me ji nav dibin. Em

neçûne ser axa çi miletekî û me êriş nebiriye ser çi miletekî û ya em dikin,

em berevanî û bergiriyê ji mana xwe dikin. Ya em dikin, şerê man û  
ne-  
manê ye û her giyanewerekî mafê hindê heye berevaniyê ji xwe, li  
hem-  
ber neheqiyê bike û em bes wê dikin. Ê her ji ber wê berxwedana  
miletê  
me ya dirêjxayen hê milletê me maye û hîn li ser axa xwe ye. Eger  
Iraq  
pêngavekê ber bi aştîyê bavêje em dê li hember wê pêngavê bi  
dehan pê-  
gavan bavêjin û eve ye hezkirina durust bo aştîyê û nexwestina şerî.  
Çawa  
mirov weko kit serşorî û milkeçiyê ji çi kesekî qebûl nake, her weha  
milet  
jî wê naxwazin û ji bo nepejirindina wê li ber xwe didin.  
— Bi dîtina min eger şer rabiweste dê partên burjuwa û rastrew  
lawaz  
bibin, li vir Gencoyî dest pê kir mebesta xwe ji cirrenîxê bi awayekê  
ze-  
laltir û vekirîtir xiste ber çavan. Xwe piraniya xelkî ji bêgaviyê, ji şerê  
Iraqê  
û Îranê û ji kuştinê reviyê û fîlarbûyê û hatiye van deran û xwe neçar  
dibîne ko çekî hilbigire û xwe bide digel aliyekî ji aliyên ko qada  
çekdar li  
deverên rizgarkirî di dest wan de ye. Di rastiyê de, vî xelkî bawerî bi  
van  
partan nemaye û pir bêzar e û eger şer rabiweste dê piranî rubide  
xwarê û

dê dev ji van partan berbide. Hîngê partên burjuwa kesê xwe namîne û

dê lawaz bin û ji bo mana xwe dê bi her layekî re be bikevin lave lavê. Bi

wî terzî delîve li ber hêzên şoreşger û bizava teorî û rewşenbîrî vedibe. Ew

tevgera nû dê zû pêş bikeve û werar bikeve nav û weha dê bizava şoreşger

û parta çîna zehmetkêş, parta pêşverû mezin û berfireh bibe û dê pêşengiya xebata millî ya gelê me bike û eve ye, bi raya min rêya serbest-

bûna milletê me.

— Hey maltirnêsnêk, ma haya te ji te heye tu çî dibêjî, Şêro enirî û li

Gencoyî kire qêrî. Hê tu ne hatiye nav jiyana rastîn û hê tu di nav wan

kevnepirtûkên teoriyan de dijî. Xuya ye tu hê rejîma hukumdar li Iraqê

115

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

nasnakî, yan tu xwe xişîm dikî. Kuro ma kî dibêje heta wî wextê tu dest-

nîşandikî, dê milletê me li ser axa xwe bimîne û nahête jinavbirin?

Diyar

e tu hukmî li ser milletî didî ko divêt ew bi raya te razî bin û li benda cen-

abê te û cenabên hevrêyên te bin heta ko partên burjuwa jinav  
diçin û  
paşî tu û hevalên xwe bizava xwe ya teorî û rêxistinkî dikin û paşî  
parta  
xwe dadimezrînin û paşî dest bi xebata xwe ya siyasî dikin. Mamo,  
dîrok  
li kar e û ranaweste. Heke bi axiftinê be hemû rê diçin aşî û çî ji  
axiftinê  
û rêzkirina peyvên ciwan û xweşîmank û teyisok jî hêsantir tineye.  
Tişt li  
ber te tevlihev bûne; tu tiştê rast û çewt têkel dikî. Tu carna destê  
xwe  
dadînê ser kem û kurîyên di nav me de û carna jî tu bê hizirkirin,  
axiftina  
xwe diavêjî û pê çewtiyeka mezintir dikî. Nê hema ev şere rawestiya  
û  
Iraq ma bê şer û mijûlahî, dê lêhmişta çek û şer û kîn û cebilxaneyê  
Iraqê  
werbigere ser Kurdistanê û hîngê ne partên burjuwa û ne jî partên  
te yên  
nûjen dimînin. Rejîma ko Melekan û Şêxwesan û Helebçe bi çekên  
kîmyewî û jehrîn bombebaran kirîn û bi komel xwecihên wan kuştîn  
û  
birîndar û seqet û derbider kirîn, ew rejîm amade ye ko Kurdistanê  
bi  
xelkê wê ve bisoje û tovê Kurdan biqelîne û wan qutbir bike. Ev teorî  
û

dîtina tu ji me re dibêjî ne ya te ye û ya hineka ye, teoriyeka biyanî  
ye û bi  
kêr me nayê. Ew bi kêr wan ne hatiye yê ko ew afirandiye, evca dê  
çi we-  
ca me tê de hebe. Ya ji hemûyan jî giringtir ew e, divêt me ageh ji  
xwe  
hebe û her tim li ber çavên me rastiye xuyabe; millet ne tişt e ko  
taqîkirin  
û tecrube li ser bêne kirin, divêt ew rêbaz û rêçareyên ji bo  
azadbûna wî  
dihêne destnîşankirin û hilbijartin, piştî gelek vekolîn û  
liserrawestiyanan  
bêne pejirandin. Tu her ji niha qala çîneyetiyê dikî, baş e bila ew  
parta tu  
behsa wê dikî û her çi parteka din jî hebe, bila çêbibin û bila xebata  
xwe  
bikin û ew tiştê herî normal e. Lê divêt tu berî her tiştî baş bizanî  
ko xe-  
bata me ya serekî ji bo azadbûna mirovî û neteweyî ye. Hê em bê  
dewle-  
ta xwe ya neteweyî ne û heke ew çêbibe, bi awayekî automatîk rê  
li ber  
hemû curên hevrikatiyên din vedibe. Di vê Rojhilata Navîn de, bi vî  
şik-  
lê nuke, ko dewleta qanûnê hê tê de cihnegirtiye, pir zehmet e em  
kurd  
bê şer û bê pehevçûn dewleta xwe dabînin, eve, çi me viya û çi ne  
viya

rastiyek e. Genco, ez nizanim tu çi kesekî, aya tu kesekî ko xwe di  
bazinê  
teoriyan de bend kiriye yan kesekî ko hê komelê xwe û doza xelk û  
welatê  
xwe û cîranên me nas nekirine yan jî tu mirovekê westiyayî û ji xwe  
re li  
delîveyekî ji bo bêhinvedanê û ji bo bi xwe ve mijulbûnê digêrî.  
Xwe tu  
li benda hindê nînî ko şer rabiweste û dirbek bi tevgerê bikeve û  
bibe ve  
aşbetalekê din û lêborîneka din ya giştî ya xapînok ji aliyê Bexdayê  
ve bête

#### 116 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

dan û xelik ref ref, weko heftê û pêncê neçar bibin û xwe bidin dest  
rejî-  
ma desthilatdar û tu yek bî di nav hemûyan de? Hîngê kes nabêje  
Gencoyî xwe da dest rejîma Iraqî û kes nabêje ew mirovekê tirsinok  
û  
xweperist bû, kes nabêje wî taqeta pêşmergetiyê ne bû, ew ne  
xwefîdakar  
bû. Lê belê, li şûna hindê, xelik dê bibêje partan şoreş xelet  
birêvebir û  
milet hevrûşî karesat û setimînê kir. Hîngê, tu li cihê ko bi xem  
bikevî û  
axînekê bo wê karesatê rabihêlî, dê bişkurî û bibêjî; nê min çend  
gote

wan û min çend caran ji wan re şaşî û çewtiyên wan dest nîşan kirin  
lê  
hemû, ya bê hode bû, ew part di binyatê xwe de rizîn e û çakî ji wan  
çên-  
abe û ev dîtina min bû, lê çi kesekî guhdariya van gotinên min  
nedikir.  
Tu di serê xwe de, bi endêşeyên weha genî çareyan peyda dikî. Hey  
pa tu  
mirovêkê pir xweperistî û dindikeka welatparêziyê di nav te de  
nîne. Ne  
weha jî, ko mirov dijminê gel û welatê xwe bêxe pêş part û hêzên  
welatê  
xwe yên siyasî, heta eger xeletî û çewtiyên wan jî pir û pir bin.  
Wê rojê keniya Gencoyî bi wê axiftina Şêroyî dihat û xwe didît ji wî  
ra-  
stir û ji bilî rêçareya xwe, wî çi metodeka dî ya çareserkirinê bi ya  
durust  
û baş ne didît. Wî, ne bes li wê dîwanê û bi Şêroyî bi tenê re ew  
gotûbêj  
kir û ew dîtina xwe xiste ber çavan, lê li gelek dîwan û cihên din jî  
babet  
hate hilêxistin û ew yê rik bû li ser lênerînên xwe.  
Ya Şêroyî wê rojê ji gotinên Gencoyî fêmkirî nedilnerehetiya  
Gencoyî  
bû ji şerê Iraqê û Îranê, lê bi dîtina Şêroyî wundabûna Gencoyî bû  
di baz-  
inê partîtiyê yê teng û tesk de. Bi şirovekrina Şêroyî bo gotinên  
Gencoyî,

gencoÿî tilên xwe li têleka pir giring dixist; aya millet ji bo partan yan part

ji bo milletî yan jî herdu ji bo hevûdu. Li ber Şêroyî weha xuyabû ko Genco digel pirta yekê bû û wî bes parta xwe li ber çav bû û bila pêşxisti-

na wê li ser kîstê çaxî û milletî û welatî jî be.

Lê digel hindê jî, Şêro ji xwe nerazîbû ko bi wî awayê dijwar li ber devê

Gencoÿî dida. Şêro di wê bawerê de bû ko Genco di rastiye de mirovekê

welatparêz e, lê şêweyê şirovekirina wî bo welatparêziyê, li gor dîtina

Şêroyî, ne ye durust bû. Bi ya Şêroyî ew awayên xelet yê fikirîn û bizivîne jî berhemên xeletiyên mezin yê serkirdayetiyan partên kurd û

politîkên wan yê çend sala nin. Şêro digel hindê bû ko van partan çewtîne mezin kirine û ew wan xeletiyên çend bare dikin ve û ew ziyane-

ka mezin digehîne gel û welatî. Wî dizanî ko lihevhatina wan hêzan ne ji

dil û can û bi bîr û bawer bû, ne li ser bingehe parastina berjewendiyên

giştî yê gel û welatî bû, lê weko taktîkeka berwext bû. Şêro ji xwe ner-

azîbû ko wî ew hizir û dîtina xwe li cem hemûya û bi awayekî vekirî ne-

117

KURÊ ZINARÊ SERBILIND



got. Wî, ji wî rexî ve, Genco ji xwe bistehtir dît û hest bi hindê kir ko helperistiyek di nava wî de jî maye. Şêroyî hest bi hindê kir ko ew di der-  
heqê Gencoî de yê dijwar bû û kêmtîşt, Genco ji tiştê ne razî bû û wî  
ew nerazîbûna xwe aşkîra dikir û hewil dida ji wan probleman re çare-  
seriyan peyda bike.

#### 118 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

– 12 –

Her digel şerrawestandinê û axiftinên aşbûnê di navbera Iraqê û Îranê de  
li Genêvê, li bin sihwana Neteweyên Yekgirtî, hukumeta Iraqê ji nav  
de  
dest bi şarandina şerê din kir; şerê jinavbirina kurdan û xwecihên  
Kurdistanê.  
Hîngê Şêroyî çav bi Gencoî keftin, lê çî axiftin li ser hindê pê re ne  
kirin, ji ber ko bi dîtina wî dem, ne yê pit pit û cirrenîxan bû. Kîmyewî  
û  
gazên jehrîn gund û bajêrk û bajarên Kurdistanê, xanî û dibistan û  
dêr û  
mizgeftên wê werdipêçan û dixwarin.  
Top û agir weke baranê bi ser xelkê de dirijyan. Holakoyê Iraqê bi  
hemû tuxmên çekên xwe yê giran û kujek û jinavbir ve êrişên xwe  
di-

anîn ser Kurdistanê û hişk û ter, zaro û pîr, jin û mêr, hemû tişt didan  
ber  
şaloka xwe ya kujek û kîndar. Enfal bûn, êrişên tuximperist û  
durunde  
bûn û mebest jê nemana mirovê Kurd bû, nemana Kurdistanê û  
xelkê wê  
bû, nemana her tişteki bû ko bikeve ber wan û ber wê kiryara wan.  
Hemû, mirov, balinde û tilor, terş û tewal, dar û bar, giş jehrî dikirin,  
disotin, dikuştin. Wê karesatê li pêş çavên her kesekî rû dida, dibin  
destê  
faşîyan de bêhinhilkêşan jî bûbû mirin.  
Carekê, wextê çavê Şêroyî bi Gencoyî keftî, wî da dilê xwe ko  
pirsyarê  
jê bike ka dîtina wî ya niha çi ye û ka hê weko berî nuke hizir dike,  
lê ya  
dev li wî girtî reftara Gencoyî bi xwe bû, ko şêroyî didît ka çawa wî  
xwe  
xistiye ber xizmeta xelkê sewdaser û derbider û perîşanbûyî. Şêroyî  
jî wex-  
tê hindê nebû ko gêngaşeyan bike ji ber ko ew mijulî arîkariyê bû;  
arîkariya xelkê dikir bona ko xwe zû bigehînin ser sinûran bi bakûrê  
Kurdistanê re û xwe derbasî aliyê din bikin, hêştta êrişa enfalan ne  
gehiştîyê û ew jinavnebirîn.  
Carna jî çavên wî bi çavên Gencoyî diketin û didît ka çawa serê  
Gencoyî ji şerman de li ber wî ranabe. Belê, Şêroyî  
şerimjixwekirinek û  
jixwenerazîbûnek di çav û dêmê wî de didîtin.  
Di êrişê de herdu, Şêro û Genco, birîndar bûn; kîmyewî ji navçavên

Gencoyî girt û destê Şêroyî yê çepê bi dijwarî hate birîndar kirin.  
Herdu

119

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

mabûn li ber derê şkeftê, li ser rêya, ko diçû ber bi bakûrê welatî  
û gelek

nêzîkî tuxîban bû.

Şkeft tijî birîndar bû, pir bû ji kal û zarok û jin û mêran. Revdeyên  
xelkên perîşanbûyîn, yên ko hemû tişt û mal û heyîna xwe li pey  
xwe

hiştibûn, yên ji dehbeyê kuştinê û kîmyewî reviyabûn, bi wan çel û  
çiya

serdikeftin û di ber deriyê şkeftê re, ber bi bakûr diçûn. Di wan  
delêveyan

de Şêroyî mêzekire Gencoyî, yê ko çend pêngavekan ji wî wêvetir  
raketibû û bi dengê birîndar û mandî gotê:

— Ha birayê Genco tu niha çî dibêjî? Te dît rawestandina şerê Iraqê  
û

Îranê li ser kîstê kê timam bû? Yan jî eve derdê me ye; em baweriyê  
bi

serboran û ya rastîn nayînin heta ko em careka din, di wî serborî de  
nejîn

û bi çavên xwe nebînin. Xuya ye hinek hene hez dikin her di  
serborgeriyê

de, di ezmûngeriye de bijîn û milletî ji xwe re bikin baxçeyê ezmûn  
û

taqîkirinan.

Birîna Şêroyî gelek diêşiya û ne dikarî gelek li ser hev bipeyive û bêhin

lê malîq dibû. Genco jî yê bê deng û mit û serçemyayî bû, te digot qey ew

çûbû cîhaneka dî û ketibû nav malxulyan û dalxeyên kûr û dûr. Piştî pîçek bêdengiyê Şêroyî domda ve axiftina xwe:

— Ax ji me û vê mejî hişkî û serreqiya me. Çima em weha ne. Li ser darê dinê çi mîletekî ji bo serbestiya xwe hindî kurdan pêwîstî bi yekgirt-

inê nîne û em xwe di vê rastiyê de nagehînin.

Axiftina xwe vebirî û çavên xwe ji ser Gencoî ranekirin û her weçku dixwest ko ew bipeyive, lê Gencoî lêvên xwe ji serêk ranekirin û Şêro

neçarbû bipeyive ve, bi hêviya ko ew bi wî rengî Gencoî pal bide axift-

inê:

— Ax ji vê demokrasî û azadiyên mayîne peyv û di jiyana me ya rojane

de nehatine bikaranîn. Bes e ko du kes ji du partên cuda bin, bona ko ne-

yartiya hevudu bikin û senga xebata xwe bêxin ser hindê bi tenê û ji aliyê

din ve dibêjin mîletî: em daxwaza demokrasî û azadiya bîr û bawer û xe-

bata siyasî dikin. Erê gelo, heta kengî xwediserdabirin û direw li xwe û li

xelkê xwe kirin? Heta kengî dozkuştin? Kengî em dê bi rastî hewil bidin

ko em di hizirkirin û peywendî û reftar û danûstandin û kar û jiyana  
xwe

ya rojane de bibin mirovekê kurdistanî yê azad û demokratîk. ko ew  
azadî

û demokratiya me ji xwe re divêt em wê ji hemû xelkê xwe re  
bixwazin û

bi destvebînîn.

Şêro di germiya axiftinê de bû dema ko Genco ji raketinê rabûye ser  
xwe û temaşayî birîndaran û refên derbiderbûyîyan kirî û paşî  
têndaye

120 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Şêroyî û got:

— Birayê Şêro te rast got, lê mixabin ez dereng bi ser rastiyê hîlbûm.

Lê

ez di yek gotina xwe de dê dijwar bim û ji wê dijwariyê nayê  
xwarê, ew

jî ew xinizkarî ye ya ko di derheqa milletê me de tête kirin. Neyartiya  
hêzên Kudristanê û pevçûnên wan yên berdewam, di wextekî de  
miletê

me tê jinavbirin, ne bes çewtiyek e lê xinizkarî ye û yê pê radibe çi  
kes be

û çi jî part û rêxistin be gunehkar û xinizkar e. Evê, ez jê nayê  
xwarê, lê

ewa min di derheqa rawestandina şerî de gotî, ez lê peşîman im û  
ez çewt

bûm.

Digel hewkirina axiftina xwe Genco ji cihê xwe livî û berê pêyên xwe

dane wê rêya xelik jê dihatin, ber bi pêşiya êrişa leşkerê Iraqê. Ew li pişt

xwe nezivirî û wî xwe li tikayên Şêroyî û kesine din negirt ko ji wî xwest-

in bimîne û ji wê derê neçe, ji berku birîna wî dijwar e û baş nabîne. Şêroyî lê kire gazî:

— Genco! Bizivire pismam, û bila dilê te bi gotinên min ne êşe.

Were

ve, tu nikarî şerî bikî. Ez ji tingijîn û êşa xwe van axiftinan dikim.

Lê Genco ne veşeriya û tivenga xwe ji milê xwe vekir û xiste nav lepên

xwe û sirûdeka agirîn û dilveker ji sîngê wî, ji gewriya wî derdikeft û ber

bi pêş diçû û li paş xwe nedizivirî.

121

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

– 13 –

Tiştê hate bîra Şêroyî, wî bi dengê bê qam bilind kire kenî û kelevajî

ser teniştên xwe bû. Êdî kenîya xwe ji dengvedana wê nas nekir »canê

canemerg û miriyan ji kavlankan, ji laşên wan dihên derê, derdikevin û

difirin û bilind, di bayî de dimînin hilawîstî li benda ko bikevin nava kavlankine din, laşine din«, ev teoriya felsefî hate ber hizra wî. Wî çaxekî

henekên xwe bi vê lênerînê fikir, lê niha dibêje xwe »dibe ko ev teoriye

rast dibêje, hema bêguman rast e.«

Tava hilatî xwe di laş û canê wî werkir, wê çavên wî bi geşî û germa xwe

ya havînî vemaliştin. Lê hê kilmîş û gilîze û birs û serma û xwîn û ax û tiş-

tine din digel bêhin û sehma ewrên kîmyewî di nava wî de têkel dibûn.

Wan şilqênêk bi wî dixist û ew radikire ser pêyan. Wî destên xwe li çokên

xwe dan û ew li ser pêyên xwe yên giranbûyîn rawestiya. Her weko wî

dixwest hêza pêyên xwe nas bike, ka dikarin wî li ser xwe ragirin ya na.

Hêvkire dewr û berên xwe, paşî hemû tişt û rûdan û ya qewimî, mîna

filmekê sînemayî hatine pêş çavên wî. Ew di nav xwe de tingijî û wî bi

xinzirîn gote xwe:

— Ma heta kengî xudan şiyar û hêz dê lawaz û hejran tepeser bikin?

Ma heya kengî dê heqiyê li bin neheqiyê tire tir be? Xwe ne dê heta het-

ayê weha be?

Wî xwest li tavê mêze bike û daxwaza bersivê jê bike, lê ew ji geşatiya

wê nikarî lê binere û berê çavên xwe wergerandin bo ser Zinarê serbilind

û kûfî xwar. Belê, wê gavê li cem wî, ji wî Zinarê her tim li cihê xwe mayî,

hemû raman û pejin û ruha xweragirî û berxwedan û reseniyê dipeşyan.

Hest bi xwe kir ko hêzek ji wî çiyayê sehîmdar tête nava wî û wî jî weko

xwe lêdike.

— Çima na? ji xwe pirsî û weko kewê rubad sînga xwe deranî û perand.

Ez kurê vî çiyayê hemîşe kevnar û nû me, ez kurê Zinarê serbilind im û

her ji ber hindê jî divêt ez jî heta hetayê weko çiyayê xwe li cihê xwe bim.

Çi hêz nikarin min û çiyayê min ji hev dûr bixin. Belê, dê evîna wî di dilê

min yê siyamendî de her û her şîn bimîne.»

## 122 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Wî ev ji xwe re got û bejna xwe ya dirêj û tijî rast kir û serê xwe bilind

kir, her weko wî dixwest zehrî çiyayî bike. Destên xwe birine cil û kincên

xwe yên peritî û ser û bin lê rast kirin û paşî ew dest dane pişt xwe û hat

û çûneka tawûskî û qiralkî kir.



— Bo çi na? Wî ev pirse çend carekan, bi mendehoşî û azirîn ji xwe kir  
û axiftina xwe bi xwe re domand. ko em ji nû dest pê bikin ve, lê çawa?  
Em her wî tiştê dubare û sêbare û dehbare bûyî careka din, ser ji nû çend-  
bare bikin ve? Yan em bi awayekê din, yê nûtir, bi rengêkê wecwegirtî ji  
çewtî û qencyên metodên berê, ji nû dest pê bikin ve. Lê ya giring ew e  
ka em çawa nûtiyê û nûkirinê têdigihin. Em çi pîrensîpan jê re datînin û  
em çawa avakirina wê dibînin û çawa bi cih diînin.  
Malxulyanê mîna landikê ew veleqand û niqoyî deryaya xwe ya bê bin  
kir. Vehewyayên geliyê Bazê hatine bîra wî. Ew gelek bûn, ne yek û ne  
hezar, lê bêtir bûn. Zaro, pîrejin, pîremêr, genc û pîr, ji nêr û mê û ji hemû temenan bûn. Hêştta karesata Helebçe kevin nebûyî, wan ji Hitler  
û berşiyên wî xerabtir kir û yên di geliyê de, di geliyê de kuştin û binbir  
kirin.  
Destên wî di berîkên wî de, li kaxezekê û qelemekî gerhan, lê berîk vala  
bûn. Ew rawestiya û ser li xwe xurand û bi rengêkê bêzjixwe kirî tif kire  
xwe û gote xwe:

— »Ma kaxez û pênivîs ji te re bo çi ne? Qey dê ew ji bîra te biçin?  
Na,  
giş, bi dêm û navçav û sîmayên xwe ve li bîra min in. Belê, ew bi wan  
xem  
û tirs û xweragirî û hêvî û bêzarî û tiştine din yên pîroz, ko di nav  
çavên  
wan de dikirine qêrî û xiriqên, li bîra min in. Ma ez çawa wan ji bîr  
dikim,  
nê ew ez im û ez jî ew im. Yê ew dîtine dibe ko xwe ji bîr bike lê ne  
wan  
û wê perîşanî û trajîdiya ew tê de bûn.  
Firokeyan barana mirinê bi ser wan de dibarand. Ew di agirê Nîronê  
Bexdayê de dişewitîn, ez û Zinar û Metîn û Xudî û kujek bi tenê bîner  
bûn li ser wê kuştare û cîhanê hemûyê jî ageh jê hebû. Wey xwezî  
ez bi  
wan re mabama û ne xweziya vê bîneriya ez ketimê.«  
Di geliyê ko bûbû goristaneka gorvekirî de hat û çû û ne dizanî ka  
ew  
bi durustî li pey çi digerhe, lê hest pê fikir, hêzek wî pal dide ko  
tiştêkî  
bike. Hind dît, bivrek û qelemekê hesinîn di destên wî de nin. Ê li  
ber wî  
dareka pir mezin, ko bombeyan ji binî ve qirandibû dirêjkirî ye. Xwe  
dît  
bi bivrî dikeve ber darê. Wî tîvilê wê ji ser havêt û dara xwe baş hulî  
kir.  
Bi navên wan hemûyan yên ko di gelî de hatibûn kuştin sûnd xwar  
ko

karê xwe bigehîne dawiyê.

123

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Wî şev û roj kirine yek û dev ji wê xebata xwe berneda. Dêmên wan çendhezaren şehîdbûyîn li ser bejna darê dinexşandin, hildikolandin. Çi

tişteki ew xav û sist nekir; ne têhin û birs û êş û janên laşê wî û ne jî dengê

balafiran û gurmên û peqîna top û bombeyan û ne jî bêxewiyê.

Wî, digel wî karî, dest pê kir baweriyê bi tişteki din jî diîne; ew jî roja

vejîn û sizadanê, roja »qiyamet û hesabê«. Lê bi metod û dêtina xwe ya

taybetî û weha ew bawerîpêkirin ji xwe re şirove dikir:

— Vejîna mirovan bi destên mirovan. Roja vejîn û sizadanê ew e ko hemû tepeser û perîşan û bindest, yên mirandî û yên nivandî, sindirîkên

xwe bişkênin, kifnên xwe bidirînin, xewa xwe biveçirînin û serî hil bidin

û bibine lihî û lafaw, bibine dadgeh û dadwer û dest bidin hefka zordar û

ziyankaran û wan siza bidin. Sembol û peykerên tepeserkirin û koletiyê

bişkênin û xende û bişkurînan vebigerînin ve bo ser lêvên jiyane li vî we-

latî. Ew roj jî hîngê dihêt li dema ko mirovên me di piraniya xwe de li xwe

û li doza xwe bi xwedî derdikevin.

Digel vê diyalogê bawerîbixwekirineka mukum li cem wî çêbû û ew li

ser karê xwe bêtir rik û rijd bû. Mirovên weko wî, ji hemû tiştan bûyî, kes

û kar û niyas lê tera bera bûyî, ne gund û bajar û mal û cihwar jê re mayî,

westiyayî, birsî, tirsiyayî, rezîl û birîndarbûyî di ber wî re derbas dibûn.

Ber bi parçeya din ya welatî, ber bi bakûr diçûn. Ji zulma dagîrkerekî di-

reviyan ber zulma dagîrkerekê din, lê çawa be, miletê li nêzîkî sinûrên

çêkirî, her çend ew jî bindest û perîşan e, lê ew jî kurd in û welatê wan yê

dagîrkirî jî parçeyeka Kurdistanê ye.

Ya kêfa wî pir pêhatî ew bû, çî kes bê awir û têbînî di ber wî re ne dibuhurîn. Gotinên cur bi cur ji devên wan derdikeftin:

— Ax Xwedêyo ma edaleta te bo kengî ye?

— Derew e, rojhilat û rojava, hemû tinazên xwe û bazarî bi me dikin û

em di dest wan de lîstikek in.

— Me xwe li benda hinekan hişt û me guh neda gotina dibêje: her reşo

bi destên xwe heke avê tu birî.

— Em hind dilsoz û xemxorên doza xwe nebûn, hindî em dilsoz û xemxorên doz û pirsên miletên dîtir bûn.

— Manê heta niha jî kurd hene weko iraqiyekî yan tirkiyekî yan

îraniyekî fikir dikin û mîna wan tişt û pirsan şirove dikin û hêştta ne  
ha-  
tine ser hindê ko bikaribin bi durustî, hiştî kurdistanîyekî bijîn û hizir  
û  
reftar bikin.

— Xuya ye ev dînbûye, heke ka çi raman di vî karê wî de ye û ka eve  
124 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

wextê hindê ye mirov xwe bi darî û resimçêkirinê ve mijûl bike.

— Pa ez dibînim karê wî ji yên me hemûyan durustir e.

— Pa heke wesa be û tu vî karê wî bi tişteke baş dibînî, fermû here  
arîkariya wî bike û weneke ew bi tenê bimîne.

— Min ew hêz tine ye û ya din jî min bawerî bi çi nemaye û ez pir  
bêzarbûme.

— Her kesê bixwaze ji dil û bawerîpêkirin tişteke bike dê karibe bike.  
Lê divêt, wî kesî, berî her tiştî, bawerî bi wî tiştî û bi wî karî û wan  
meto-

dan hebe û mixabin baweriya me gişan weko xwe nemaye û hatiye  
sistkirin.

Van deng û gotin û rayên jêkcuda ew xav û sist û bêzar ne kir lê bi  
pêçewaneyî wê, wî bi gîrgirtî dom da karê xwe. Gotinên dawiyê yên  
bi

ber guhên wî keftin ev bûn:

— Lezê bikin, leşkerê Iraqê nêzîkî me dibe û çi nemaye me  
dormandor  
bike.

— Hey li wî û babê wî yê xwe qurtal bike.

— Birevin, eve faşî û kujekên Iraqê bi ser me de hatin.

Wî qet hest bi tirsê nekir, lê lez li karê xwe kir. Dêmek bi tenê mabû  
û  
bi çêkirina wî dêmî karê wî timam dibû, lê ew dêm ne dihate bîra  
wî.  
Dêm yê zarokê bû, zarokeka sava ko di himbêzên dayika xwe de,  
bi wê  
re hatibû kuştin. Dixwest dêmê zarokî jî bêxe ser wî cihê li ser darî,  
bi rex  
dêmê dayika wî ve, jê re mayî vala.  
Bizaveka dijwar digel xwe kir bona ko navçavên wî di mejiyê xwe de  
wêne bike, lê bi dest ve nehat. Dibe ji ber ko zarok berî kuştina xwe  
bi  
çend seetekan ji dayik bûbû û hê ruxsarê xwe yê durust ne girtibû.  
Dengê  
peqîn û teqîn û balafir û dengine nexweştir nêzîkî wî dibûn û hilma  
kîmyewî ya kujek xwe li difnên wî dida. Lê hizra wî mabû bes li ser  
dêmê  
wî zarokî bi tenê bona ko wî jî bêxe ser bejna darî, bi rex wan çend  
hezar  
dêmên din ve.  
Çi nemabû êriş nêzîkî wî bibe. Çavên xwe niqandin û cîhana derve  
bi  
hemûve ji hizra xwe dûrxist û hizra xwe bi hemû ve xiste ser dêmê  
zarokî  
û ka çawa bû. Tefşiyê di dest wî de, hê li ser wî cihê vala yê li ser  
darî bû,  
li dema ko qêriyeka dijwar ew veciniqandî û cilfek pêxistî. Ew qêrî ji  
kê û

ji kûderê hat, ji wî, ji darî, ji kê, wî nezanî. Lê ya ew pê hesyayî dar êdî

nemabû dar û dema çavên xwe niqandîn û vekirîn ve, dit ko li ser wî ci-

hê vala di darî de, dêmê zarokekê di xwînê de werbûyî çêdibû, geş dibû û

ronahî jê dipeşî. Ew dêm bi dêmên din yên li ser darî re bi can dikeftin û

125

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

dibûn mirovên bi goşt û hestî. Di wan gavan de dengên durunde û hov-

ên Iraqê nêzîkî wî dibûn û wî neviya darî bi tenê bihêle.

Temaşayî Zinarî kir û xwe weko wî didît, mîna Zinarî li cihê xwe mayî û mukum û xweragir û biryar stand ko darê xwe ji êrişa faşiyên biparêze.

Lê çawa? ji xwe pirsî. Hizra rakirina wî kir, lê dar yê giran bû. Xwe dît ko

hêzek di nav wî de, destên wî pal dide û di bin darî re dibe û wî xwest bi

hemû hêza xwe ve darî ji cihê bilivîne. Tiştê ko çirîse bi serê wî xistî ew bû,

dar bi xwe, ji cihê xwe livî û weko zarokekê pir sivik kete ser destên wî û

li ser milê wî binecih bû. Ronahiyek ji darî diçû û car bo car geştir dibû.

Hemû dêmên li ser darî bi ezman dikeftin û sirûda »Herne  
pêş...herne  
pêş« bi dengekê bilind û hêzdar ji devên wan derkeft. Wî hest bi  
hindê kir  
ko dar bilind dibe û ew jî pê re bilind dibe û digel darî difire.  
Leşkerê Iraqê jî berê tev çek û amîrgeha xwe ya şerî û kuştinê dida  
darî.  
Lê kêla çekên wan her dibûn ew bi xwe. Tevaya agir û gulle û  
bombeyên  
wan vedigeryan bo wî cihê jê derdikeftin û her bi wan bi xwe ve  
dipeqiyên.  
Wî xwe didît yê li hindavî Suleymanî û Duhok û Mehabad û  
Diyarbekir û Kerkûk û Sine û Dêrsim û Erbilê. Li hindav tev bajar û  
ba-  
jark û gund û hîşetên Kurdistanê. Didît ko giş rûniştivanên welatê  
wî li  
derve ne, çavên gişan bi darî ve girêdayî ne û ew pevra, bi dengekê  
dijwar  
û pir xurt, duruşm û sloganên mîna hev dibêjin. Dêmên wan yên li  
ser  
erdî her mîna wan dêman bûn yên wî li ser darî hilkolandîn.  
Wê gavê wî dizanî ko canê canemergên Helebçe û Behdînan û  
sertaserî  
Kurdistanê dadikeftin bo nav wan laşên li ser erdî mayîn. Her canek  
li ser  
gelekan belav dibû û weha xelik hemû digehandine hevudu û  
dikirine  
yek hêz û ew hêz dibû lihî. Wê lihiyê dijminên mirovatiyê, faşîst û



nifîşperêş radimalîştin. Piştî ko lihiyê hemû erd vegirtî, ba û bahoz  
û lihî

rawestiyan û dibû roja vejîn û sizadanê.

— Şêro! Hilo rabe hê baranê xîveta te ne birî.

Wî bi wî dengî ageh ji xwe bû. Seh kire xwe, wî xwe ji serma û sirê  
wer-

pêçabû serêk, baran ji banê xîveta tenik û dirhayî, ji tenîştên wê yên  
kunkun hatibû ser wî û bin wî. Wî lêvên xwe miçandin û lama xwe  
ya jêrî

gest. Wî serê xwe hijand û ew bi herdu destên xwe girt û givaşte  
serêk.

Dixwest xwe qayil bike ko ew, ya ko wî dîtî, rast bû. Çavên xwe  
girtine ve

û xwest hizra xwe bêxe ve ser wê bûyerê, lê dengê cendirmeyan û  
çadira

diryayî û birs û sermaya wê derê û sîma ko kempa Mêrdînê  
dormandor

dikir, guman li nik wî nehişt ko ew, ya ko wî dîtî, ne rastî bû lê  
xewnek

126 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

bû. Lê di nav wî de baweriyek hebû ko çî zû û çî dereng dê her  
tişteke wisa

rûbide.

127

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

— 14 —

Ew çend heyvek bûn li ser hatina wî bo bakûrê Kurdistanê derbasbûbûn.

Wî wesa hest pê fikir her weko ew ji devê gurgekê verestine bona ko

bikevin bo nav devê gurekê dî ko bi dîtina wî Tirkiya bû. »Ew dixwazin

me ji xwe re bikin dûvelank û me ji bo berjewendiyên xwe bikarbînin,

hey pa xişîm in. De bila di kevilên xwe de birizin«, ev gote xwe û hizra wî

kete ser tişteki; Ka çawa wê nalenal û janên wî xelkê derbiderbûyî û li qi-

narêdayî bigehîne cîhanê.

Hêj defterkên wî pê re bûn, di yekê de navnîşanên dost û hevalên ko ji

welatî derketibûn hebûn. Berperên wê vedan û li navnîşana hevalekî ko

demekî pêşmerge bû li devera Berwarî Bala, gerha. Wî pêşmergeyî welat

hişt û derkeft derê û piştî derkeftî kaxezkek ji Şêroyî re şandibû û tê de

navnîşanên xwe jî nivîsandibûn. Wî navnîşanên wî hevalî dît in û kêfa wî

pir bi hindê hat.

Wî hizra xwe di hindê de nekir ka ew heval dikare çi bike û çi neke, lê

ya giring li nik wî ew bû ko wî kesek dît ko dikare ya di nav xwe de, wê li-

hiya pengiyayî berde ser kexezekê û ji wî re bişîne. Qelem bi dest  
xwe girt

û kete ber nivîsandinê û piştî çendekê ev kaxezk ji wî hevalî re  
nivîsand:

»Silavên mişextî û derbiderî û rezîliyê!

Kekê min, ez nizanim çawa vê kaxezkê ji te re binivîsim, çunkî eger  
ez

ya di dilê xwe de hemûyê ji te re bibêjim, kaxez têra nakin.

Îro her kesekî, her gund û bajarekî, her çiya û geliyekî, her darekê û  
her

tilorekî çîrokeka xwe ya pir xemgîn û bi jan heye.

Her piştî ko Îranê biryara 598-ê qebûl kirî, xwecihên deverên  
azadkirî

ketine di teqelegê de. Çunkî giş di wê bawerê de bûn ko dijmin dê  
êrişekê

bîne ser wan. Rejîma Iraqê her zû hemû hêzên xwe ko hejmara wan  
nayê

gotin vekişandine Kurdistanê. Bawer bike çi hêzeka weha mezin ne  
bir-

bû, ne Faw û ne jî Mihemereyê.

Enfalan, ji hemû deriyên dest pê kir: Ji Akrê, Dînartê, Nihêlê,

Bakurman, Şêxan, Etrûş, Duhok, Zawîte, Sersing, Mangêş, Dêrelûk,

Şêladiz, Geliyê Zaxo, Batûf, Bêgova, Kanîmas, Amêdî, Qediş,

Bamernê,

128 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Dûkerê û hemû cihên dîtir mîna Senat, Şeraniş, Kişan, Balole, Hiror,  
Bêduh, Deştanê û li seranserê Kurdistanê.

Iraqê li 18/8 1988-ê pilana xwe ya Enfalan û destpêkirina êrişan danî.

Mebesta wan girtina sinûran û paşî jinavbirina kurdan û xwecihênKurdistanê bû. Di 25.08.1988-ê de firokeyên cengî bi awayekê

berfireh gundên deverê dane ber bombeyên kîmyewî. Xelkekê pir hate

kuştin.

Di 28/8 1988-ê de êrişa dijminî ya mezin, ji wan hemû rexên min li jor

destnîşankirîn û bi mebesta girtina tuxîban û ji kurdan re deynana kuş-

targeha giştî, dest pê kir.

Xelkê, mal û tiştên xwe hêlan û bi canê xwe bi tenê ve derkeftin.

Rewşeka weha peydabû ko di xeyala mirovan de nebû. Her pêşmergeyekî

û her çekdarekî berê xwe da mala xwe bona ko wan biparêze û wan der-

basî sinûran bike.

Sehmeka mezin bi serê xelkî keft û ew ji hêz keftin. Şer ji me nehat.

Her

yekî ji me xwe dît yê bi tenê. Nêzîkî 70 hezar kes hatine ser sinûrên ko li

ser navê Tirkiyê ne. Gelek jî bi rêve mirin yan ketine nav destê dijminê

har û hov. Çendhezar malbat di geliyê Bazê de ketine nav destên neyarî

û hemû berzebûn û dibêjin ew di 29/8 1988-ê de, bi bombeyên  
kîmyewî  
hatine jinavbirin. Rewşeka wisa tengav û aloz bû ko keç û kur û  
dayik û  
bab û jin û mêr hevudu wunda bikin.  
Gelek jê ketine nav xefk û boseyên dijminî; çwar zarok di sevîkekê  
de li  
ser piştta dewarekî ketine dest dijminî û ji hinek malan, ji hejmara  
bîst ke-  
san, yek jê ji dest dijminî qurtalbûye. Hinekan jî heya vê gavê jî ageh  
ji kes  
û karên xwe, ji dayik û bab û zarokên xwe nîne û nizanin ka çi bi  
serê wan  
hatiye.  
17 kes ji gundê Çelkê, 11 kes ji gundê Kurêmeyî û gelek ji gundê  
Wermêlê hatine girtin û di cih de gullebarankirin. Piraniya wan yên  
ko  
xwe dane dest Iraqê her di cih de, piştî êxsrîrbûnê hatine kuştin.  
Yên ne  
kuştî jî girtin û birin bo deşta Erbîlê. Ew di wan ordîgehên zoremilî  
de  
pir rezîlbûn e.  
Hindî gundên devera Behdînan bûn xwe kolikek jî ne hiştiye, hemû  
xanî û gund û tişt û mişt sotin û xerab kirin. Piraniya rûniştivanên  
dev-  
erê berî hatina leşkerê Iraqê xwe gihandine ser sinûran digel  
Kurdistana  
bi ser Tirkyê ve.

Di 29/8 1988-ê de hemû peywendiyên me bi serkirdayetiya pêşmergeyî re hatine birîn.

129

## KURÊ ZINARÊ SERBILIND

Hêzên leşkerê Tirkiyê pêkul kirin rê li ber me bigirin lê neşyan wê li-

hiya xelkê rabiwestînin û bo paşde vebigerînin. Qereqolên wan gundan

daxiryane ser wan sinûran û ketine nav jin û zarok û pîremêran û ew dane

ber qontaxên tivengên xwe û xwestin wan bavêjin ve bo nav agirê şerî, bo

ber bombe û top û jehra Iraqîyan.

Rewşeka gelek nexweş û tengav bû, bawer bike, wî halî carna em wisa

tengav dikirin, ko bû egera hindê ko hinek, xwe ji xeman û bêgaviyê bikujin.

Armanca Tirkiyê ew bû sinûran bigire û arîkariya Iraqê bike. Lê ji dest

wan derkeft û ew xelkê bêzar û perîşanbûyî bi dar û keviran êrişî cendirmeyan bûn û cihên xwe di wan geliyan de kirin.

Piştî sê rojan Tirkiyê daxuyaniyek derxist ko dê me vebiguhêze kemp. Em deh rojan man li Colemêrgê û paşî em birin bo ordîgehê Silopiya. Kemp 4 heta 5 kîlometran ji Birehîm Xelîlan dûr e. Kemp bi dîwarekê bilind dormandorkiriye. Li ser wan dîwarên bilind têlên ji hesinî hene û stiryên ji hesinî bi têlan ve nin.

Em di vê kempê de deh hezar û pênc sed kes bûn. Nêzîkî heşt sed kes  
di bin çadîran de bûn û yê mayîn li ber tehirka tavê bûn. Xwarin li wê  
derê tirşikê zelal bû; dema mirovî nokek yan pirteka pitatan tê de dîti-  
ba, da ji kêfan de giriya mirovî hêt. Bi kurtî xwarin, nan û aveka bi tem-  
atê şêlandî bû. Ça tune bû. Derkeftin ji kempê qedexe bû, seredan qedexe  
bû û arîkarî ji derve, ji kurdên deverê dihat, lê cendirmeyan ne dihişt ew  
bikeve hundurî kempê.  
Piştî 15 rojan hinek ji me hatine veguhaztin bo kempa Mêrdînê.  
Hejmara me di vê kempê de nêzîkî 16 hezar kesa ye. Ha zivistan hat û hê  
em li bin çadirên dirayî nin. Li vir sermayeka zor heye û bayekê sar yê bi  
hêz dihêt. Cilkên zivistanê û nivînkên xewê tine ne. Her deh dwazde ke-  
san sê çîwar betenî hene. Xelik neçarbûye ji tirsê sermayê, ji wan betenîyan,  
ji xwe re cilkên zivistanê çêdikin.  
Gelek êş peydabûne; zikêşî û serêşî û gêjbûn ji hemû êşan mişetir in.  
Her roj neh deh zarok dimirin. Derman û dermankirin weko pêwîst nîne.  
Birîndarên kîmyewî di nav me de hene, lê Tirkî dixwaze wan wunda bike yan  
weneke rojnamegerên biyanî wan bibînin. Me pir hewilda

rewşa xwe, bi ruyê wê yê rastîn bêxin ber çavên Xaçê Sor û Amnestî  
û

Parlementoya Ewropî û rojnamegeran.

Di van rojên dawiyê de otomobîlek carna cilka û pêlavan û tişt û  
miş-

130 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

tine din tîne û difiroşe, lê belê giran, bi du qatî bazarî difiroşe. Niha  
tiştên

hişik yên xwarinê mîna noka û nîska 10 rojan carekê didin me û ew  
pir

kêm e û carna ew deh rojên wan dibin 15 û 25 roj. Hindî birinc û  
şekir e

bi çavan jî nayên dîtin.

Hizir bike, di van rojan de cendermeyan naylon anî bona ko bi ser  
çadirên diryayî de vedin û gotin eve ji we re 25 hezar metrên  
naylonî, lê

dema me naylon pîva derket 7 hezar metir. Evca her tişteke û karek  
li vê

derê, bi vî terzî û vî awayî ye. Bertîl rolekê pir mezin dileyize û çavên  
berpirsyarên Tirkan heta li wî parîkî jî ye yê di devê me penaberan  
de.

Her weko ji gotin û reftarên Tirkiyê xuya dibe, ew me bi penaber  
nastîne. Hindî ji dest wê dihêt, ew probleman ji me re çêdike û  
jiyana me

li vir nexweş û tengav dike bona ko em bêgav bimînin û xwe bidin  
dest



Iraqê. MÎT penaberan dibe vekolînan û ji wan dixwaze ko bi wan re kar bikin. Dema kesek gelek ne xweş dikeve, ew wî dibin nexweşxaneyê ba-jêrî lê nahêlin çî kesek ji kurdên wî bajêrî pê re bipeyive û eger kesekî hewilda bi wan re bipeyive, mîtên bi nexweşî re, wî kesî didin ber zileh û şeqaman.

Ji bilî penaberên Silopiya û Mêrdînê, 13 hezarên din jî di kempa Diyarbekrê de ne û 7 hezar di ya Mûşê de ne.

Di vê dema dawiyê de sê xwepîşandan di kempa de hatine kirin. Yek ji wan di 12/9 1988-ê de, di kempa Silopiya de, li dijî rewşa kempê ya pir xerab hate kirin. Rojnamevanên rojava hatin bo nav kempê. Cendirmeyan jî birîndarên kîmyewî ji ber çavan veşartin bona ko roj-nameger wan nebînin. Penaberan jî ji cendirmeyan daxwaza wan birîndaran kir ji bo ko rojnameger wan bibînin û li ser wan binivîsin, lê cendirme û polîsan guh neda daxwaza penaberan û hevalên wan yê birîndar neanîn. Penaberan jî xwe bê deng nekir û dest dan kevir û beran û êrişî cendirme û polîsan bûn. Cendirme û polîsan jî berê luliyên tivengên xwe dane penaberên xwepîşander û gullebaran kirin. Du pen-

aber hatin kuştin û sê birîndarbûn û her weha çend cendirme jî  
birîndar-

bûn.

Di kempa Diyarbêkrê de jî û ji ber reftara cendirmeyan ya nebaş  
digel

penaberan, penaber û cendirme û polîs hevrûşî yekudu bûn û di  
herdu

aliyan de birîndar keftin.

Bawer bike hindî mirov binivîse hê kême û mirov nikare hemû êş û  
janên vî xelkê me yê perîşan û derbibe bîne ziman.

Ez nizamim, gelo wujdana mirovatîyê mirîye yan ageh ji vê karesata  
me

131

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

nîne, heke çima ew arîkariyeka rastîn ji me re nakin?

Mirov digel vî xelkî be û kesek be ji van çîrokan be, bê çîrok nabe û  
pêwîst e her yek ji me çîroka xwe bibêje û wê bi ziman bêxe.

Carna ji ber sermayê û nebûna lihêfk û beteniyên heta berê sibê  
xew bi

çavên me yê mandîbûyî nakeve.

Dibe ko tu bawer nekî ko eve ji sê mehan bêtir e, me, ne goşt û ne  
fêqî

û ne zerzewat, ne bi çav dîtine û ne xwarine. Em di rêza toalêtê de  
nêzîkî

seetekê radiwestin heta gera me û mîstin û rîtinê dihêt. Eve sê meh  
in, ji

bilî ko carekê, di edebekê de, bi ava tezî, heke me ser û laşên xwe  
ne şûş-

tine.

Tirkiyê di van rojan de xelkî dizoxîne bona ko derbikevin û kî ve biçin  
bila biçin, bes li cem wê nemînin. Piraniya penaberan weha dikin û  
for-

mên daxwazîkirina mafê rûniştinê bo welatên cur bi cur pir dikin û  
pi-

ranî ji bo welatên ewrupayî ye. Ez bi xwe, bi rastî li dijî vî karîm e û  
ez pir

pê diêşim û min navê xwe di çi lîsteyan de ne nivîsandiye û min çi  
formên

ji wî rengî jî ne pir kirine.

Ez hindî tême xwe, ez nikarim dev ji welatê xwe ber bidim; dilê min  
her

digel xelkê min e, bi bajar û gund û Kurdistana min re ye, digel wan  
de

ye yên ko xwe ji bo azadiya me şehîdkirine.

Rast e kêmasî gelek hebûn û nexasme vê carê; serkirde û serkêşên  
me ji

çewtiyan bûbûn tilove û hê dikin, lê divêt em ji bîra xwe nebin ko  
ev

dirbê dijminî dirbê tirsinok û hov bû û bi tivenga rep û rût şerê  
kîmyewî

nayê kirin. Lewma ez dibêjim ko pêwîst e em û nemaze rêber û

siyasetmedarên me, bi ciddî li ser ya ko heta niha wan kirî û hatiye  
kirin

rabiwestin. Wê hemûyê hilbisengînin û vekolînan li ser bikin û berî  
ko  
pêngavine din bavêjin bizanin dê çawa û bo çi û ber bi çi armanc û  
ber bi  
kûderê ew gav dê hêne havêtin. Divêt em li dû metod û rêçareyên  
nû û  
armancbertir û kêzîyantir bigerhin.  
Ez li vir nizanim ka hûn, kurdên li Ewropayê dikarin çi bikin, lê bêgu-  
man tiştêk ji dest we jî dihêt û hûn ji me bêtir dikarin cîhana derve  
û raya  
giştî ya wan welatên hûn tê de dijîn li ser vê ya bi serê me têt  
agehdar  
bikin. Ji wan re bibêjin ko Iraq û dagîrkerên din yê Kurdistanê, me  
bi  
wan çekan dikujin, yê ko ew çêdikin û difiroşin van mirovkujan.  
Hûn  
dikarin dostên me li wan dera pir bikin ji bona ko destê arîkariyê  
dirêjî  
miletê me yê bindest bikin. Lê wan têbigehînin jî ko ew arîkariya  
wan ya  
bi rêya Tirkiyê dihêt, ji gayî guh jî nagehe me; Tirkî, eger ne hemûyê,  
pi-  
ranyê ji xwe re didize. Hûn, eger xwe hebekê biêşînin, dikarin di  
warê di-

### 132 KURÊ ZINARÊ SERBILIND

ravî de alîkariyeka diravî ji milletê xwe re bişînin.

Heval, xwezîkên wê rojê em û hûn, hemû bi hev re di welatê xwe  
yê  
azad de hevudu bibînin û milletê me serê xwe bi tenahî û aştî dabine  
ser  
balgihê xwe.«

Şêro, 18/11 1988, Mêrdîn

Piştî ko Şêroyî kaxez timam kirî, ji wî hevalê xwe re şand. Paşî xatra  
xwe

ji hevalên xwe yê di kempê de xwest û xwe bi şev vedizî û ji kempê  
derkeft û berê pêyên xwe da warkên caran li başûrê welatî. Şêro  
gelek yê

bi lez bû ko xwe bigehîne wê derê. Wî digote xwe »xwezî neçarî  
hindê

nevim ko careka din dest bidim ve tivengê û xwezî ko her tişt bi aştî  
û

diyalogê bihête çareserkirin«. Lê wî baş dizanî ka çawa çeplêdan  
bi

destekî bi tenê nabe her weha aştî jî bi hezkirina wî û bi wî bi tenê  
bicîn-

abe û divêt yê di jî baweriyê bi hindê bînin û ji dil bo hewil bidin.

Hindî ew nêzîkî rûgehê dibû, wî, di nav xwe de, hesteka bêtir bi  
şadbûn

û serbilindiyê dikir û her weko barekê giran ji ser milên xwe dihavêt  
û di-

gel xwe sirûda nîştîmanî ya kurd »Ey reqîb« digot û rêya ber bi bûka  
dilî

berneda û li pişt xwe ne zivirî ve.

KURÊ ZINARÊ SERBILIND

SILÊMAN DEMIR

roman

LABÎRENTA CINAN

www.nefel.com

info@nefel.com

NEFEL

LABÎRENTA CINAN

1

2

HESENÊ METÊ

NEFEL

Stockholm

2002

3

Hesenê Metê:

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

© Hesenê Metê û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-973195-7-0

Çapa kevin: Welat 1994 û Avesta 2001

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Şeytan xwedê ye  
û Xwedê jî şeytan  
ez hatim hînkirin  
ko herduyan jî bihewînim  
yekî bi babetekî  
yê din bi babetekî din  
lê babet her yek bûn

GUNNAR EKELÖF

Weke bayên payîzên hersalîn îro jî ba tê, bi qasî çend rojên din,  
dibistan

ê vebin, zarok ê dîsa li hewşên dibistanan bilîzin, qêrîn û giriyên  
zarokane

ê bilind bibin.

Ev serê salekê ye ko mamoste Kevanot li bendî bersivekê ye, ew  
bersiva

ko wî bi dilpekîn dipa, îro nû gîhîştiye destê wî, anuha li bajêr, li ser  
sekû-

ka eywana mala xwe rûniştiye, ew kaxeza bersivê girtiye destê xwe,  
bi

tirseke bênav diricife û dixwîne, piştî xwendinê êdî bi çavên xwe jî  
ewle

dibe ko ew wan tiştên li ser kaxezê rast dixwîne, ji nişka ve tişteki  
weke

tîrê xwe di serê wî de badide, ricifîneke bêmane bi laşê wî digire,  
dilê xwe

bi xwe dişewitîne, lêvên wî dilerizin, av bi çavên wî dikeve û di dilê  
xwe

de: »Rast e, ez bi kêrî hîndayînê nayê. Serê min bûye weke hêkeke  
genî,  
tevgerên min êdî ne tevgerên mamosteyekî ne. Lê ez anuha  
têdigêhîjim.

Ew gunda... av û kuçên wî gundî...« dibêje, wê kaxeza bersivê  
hêdîka

datîne kêleka xwe û bi raman vedigere ser wan salên xwe yên  
buhurî.

5

Di demên koçmaliyê de ew hemû hûr û tiştên ko hertim ji ber  
dimînin

an jî di qul û qelişên malê de ji bîr dibin, çar sal, rasterast çar sal  
beriya

nuha, mamoste Kevanot wan tiştan jî berhev dike, davêje paşiya  
kevne-

texsiya xwe, kewaniya xwe ya ciwan dide kêleka xwe û ji bajarê D'ê  
hêdî

hêdî ber bi bakur dajo.

Di rê de çêlî mijarên bextiyarî û astengên wê dike, carina pişirînên  
bex-

tiyariyê li ser lêvên wî diyar dibin, çavên xwe ji riya pêşiya xwe  
vedigerîne

ser kewaniya xwe û dibêje:

— Nêrgisa min... ma nayê bîra te ko apê Simko... zimanê min lê  
nagere, lê di destpêkê de bavê te gelek astengî raxiste pêşiya min!...



»— Keçên me têra xortên eşîra me nakin, me keç nîne ko em bidin  
ba-  
jariyan.« digot û pê ez ji wir dûrdixistim. Ji ber vê yekê carina dilê  
min bi  
xwe jî ji min li hev diket, ez ji xwe dişikiyam, pê dêşiyam û heta çend  
ro-  
jan jî ji bîra min ne diçû. Min dixwest ez pê bidime zanîn ko pêjnên  
evîn-  
dariyê, tenê bi tişteki têne girêdanê û ew jî dil e. Ko ew dila li ba kê  
hebe,  
ew pêjnên pîrozwer jî rojekê bi wir ve têne girêdanê. Li ser vê  
nimûnê,  
min gelek tişt jê re bi lêv kirin. Lê min çî dikir ne dikir, ew ji gotina  
xwe  
danediket û hertim:  
»— Nabe, xoce, nabe!« digot. Min î ko nêhirî nabe, vê carê jî min  
xwe  
havêt bextê wî û jê re got:  
»— Rast e, Apê Simko, ez ne ji eşîra we me, ez ne çiyayî û ne jî deştî  
me.  
Wek ko tu jî bi kerem dibêjî, ez bajarî me. Lê beriya hertiştî, ez jî  
merivek  
im. Merivekî ji we me, zimanê me, dîroka me, berbora me... ken û  
giriye  
me yek in. Çima dildariya koçerekê, nebe para min? Binêre, Apê  
Simko,  
ko ev tevgera min dûrî berborê be, wê çaxê ez dikanim xwe bavêjim  
bex-

tê ciwamêrekî û bila ew were keçikê bixwaze. Çîrokek dirêj e, lê di roja

îroyîn de min ne dê û ne jî bav heye. Loma min xwest ko tu baviyekê ji

min re bikî û ji vê daxwaza dilê min re nebêjî na...« Li ser van gotinên min, dilê wî hinekî nerm bû, lê dîsa jî têra razîbûna wî ne dikir. Bi saetan

li ber rûdiniştîm, bi giramgîrî min rûmetek mezin didayê ko ew jî li hem-

berî min têkeve rewşa xezûrtiyê. Lê ne dibû û ne dibû... Heta wê dema ko

diya te mizgînî da min... hezar carî mala wê ava!... Bi rastî jî jineke dilpak

6

û dilovan e. Lê... wê jî gazinên xwe dikir û hertim bi hustuxwarî digot:

»— Belê, tu mamoste î... lê hûn bajarî ne û em koçer in. Em... cî û warên me li gor demsalên salan e. Zivistanan em li jêr û havînan em li jor

in. Ko em berê keçika xwe bidine deverên dûr û wê bişînin... êdi çavê me

ê zû bi zû bi xezala me nekeve. Lê hêvîdar im ne rewşeke ewqas xemgîn

be!...«

Mamoste Kevanot dîsa bi pişîrîn berê xwe dide kewaniya xwe didomîne:

— Lê Xwedê merivan ji zarxweşiyê neke! Wusa xuya bû, Apê Simko jî  
ji vê zarxweşiya min kêfxweş bû bû û di dawiya dawîn de bi vê daxwaza  
min qayîl bû... Ma ne wusa, berxika min?...  
Berxika wî çavên xwe ji riya pêşiya texsiyê dizvirîne ser wî, dû re serê  
xwe dixê ber xwe û bi tevgereke zarokane dibê:  
— Nizanim ko...  
Nêrgisa koçer rast dibêje, beriya vê bûyera zewaca wan, ew li mala bavê  
xwe ye, ne hay ji evîna mamoste Kevanot û ne jî hay ji serêşa bavê  
xwe  
heye, carekê tenê ji devê diya xwe dibihîze û ew jî ne bi dûrûdirêjî,  
»Berxika min, mamostê X'ê dil ketiye te... lê ez nizanim bavê te ê çi  
bibê-  
je.« dibêje, bêyî ko ji diya xwe re peyveke piçûk bi lêv bike, Nêrgisa  
koçer  
tew li ser vê girîngiya girêka jiyana xwe nafikire jî, di vî salê xwe î  
hîjdehî  
de ew jî weke gelek keçên koçer ji hinek aliyên jiyane bêpar e: çûye  
bêriyê  
pez dotiye bêyî ko guhanê wan bêşîne, lolep di dest de dew kîyaye  
bêyî ko  
meşka wê çilkan bireşîne, bêyî ko mast tirş be şîr eyvan kiriye... bi  
kurtî  
mîna seriyek penîrê koçerî, xwediyê dilekî pak û sipî ye, anuha jî  
wusa ye,

lê bi vê bersiva wê re mamoste Kevanot destê xwe î rastê ji dîreksîyona

kevnetexsiya xwe radike, ber bi ruyê wê dibe, bi serê tiliyên xwe biskê wê

î kej ji ser gupa wê dide alî û dibêje:

— Bi rastî ez hîn jî nizanim ka wê çaxê tu çi difikirî, kevoka min. Ez bawer im, nuha te jî di dilê xwe de digot, ev tişt naçe serî, weke bavê xwe

te jî digot, ev mamostekî bajarî û ez jî koçereke çiyayî!... ne wusa? Pişirînên zarokane li ser lêvên Nêrgisa koçer xuya dibin, bi çavên xwe

yên gir li mêrê xwe î mamoste dinêre û herdu girikên piyê xwe jêlî hildikute, bi vê tevgera wê re ricifîneke mîna aveke şîrgermî xwe ji serê

mamoste Kevanot heta bêçiyên lingên wî berdide, ji nişka ve dilê wî bi vê

kevoka koçer dişewite û anuha baş têdigêhîje ko koçera wî hîn jî ne hay ji

zewacê û ne jî ji tama wê heye, vedigere ser dilê xwe û li wir dibêje:

»Çi

aferîdeke bêguneh e, Xwedê!... weke horiyeke asimanî!... lê divê ez jê re

7

kat bikim... hemû tiştên ko ez dizanim, jê re bi lêv bikim û jê re bibim alîkar...

bila têbigêhîje, bila fêrî jiyana şaristaniyê bibe û bila bi awakî şareza ji

jiyanê bitamije...« û bi van monologên xwe re mamoste Kevanot bi pêjnên

gunehkarekî careke din li vî ruyê şermok, ruyê koçera xwe dinêre, daxwaza

gotina rastiyeke lê radibe û dibe:

— Lê ez li ser te dîn bû bûm, berxika min! Carina xewên şevan li min direviya, radibûm di oda xwe de ji quncikekî diçûm yê din, min gelek tişt

di serê xwe de dicivand û belav dikir, min ava dikir û dîsa hildiweşand.

Lê... rast e salên min ne ewqas zêde ne ko ez bibêjim, ez pir jiyame û min

gelek dîtiye... tenê şeş salan ji te mezintir im. Lê... ez ne merivekî ewqas jî

naşî me. Min hay ji berê dunyayê heye û ez dizanim bê pîvana zewaceke

rastirîn çawa ye, an jî çawa dibe... Lê dildarî serê xwe bixwe! Hertîşt li ber

çavên meriv reş dibe û ji bilî dev û lêvên yarê, meriv tişteke din nabîne. Kê

bêhna bêçiya xwe dikir ko Kevanot ê bibe dildarê Nêrgisa koçer!... Min

guhdariya gelek çîrokên dildariyê kirin, min gelek evînromanên ji pênuşên cuda cuda xwendin... lê ez ji te re sond dixwim ko heta wê rojê

jî min baweriya xwe bi evîndariyê ne hanî bû.

Mîna ko Xwedê ew destê wî rasterast ji bo rojeke weha, ji bo tişteke we-

ha çêkiriye, li vir ew destê mamoste Kevanot dîsa pê nasekine, li ser dîrek-

sîyonê nahewe, ber bi ruyê jina xwe radike, tiliyên xwe di nav biskê wê î

kej re dike û dipirse:

— Ka tê bîra te bê min û te kengî hevdu dît, koçera min?

Nêrgisa koçer hinekî dirame, bi rûkenî li ruyê mamoste Kevanot dinêre, dû re peyvikek kurt tenê ji nava lêvên wê yên tenik difilite û dibê:

— Na...

— Cara pêşîn, koçera min, cara pêşîn... De ka bîne bîra xwe bê cara pêşîn te ez li kuderê dîtîm.

Anuha mîna ko koçera wî ji wan deverina, ji wê kevnetexsî û kêleka mêrê xwe dûr û dûr li moriyekê bigere, çavên xwe yên gir hêdî hêdî dide

hev û dû re dibê:

— Li zoman.

Bi mebesta ko mêrê wê bibêje: erê rast e û te têderxist, bi kesereke bêwext re du cara serê xwe ditewîne û dibê:

— Sala çûyî di rojên destpêka buhara paşîn de bêhna min pir teng bû

bû. Ez nizanim bê çima, lê di rojên buharên paşîn de pirî caran wusa xemgîniyekê digire ser min. Xwe bi xwe: »Stajeriya li cî û gundên weha,

serê xwe bixwe!« min got û wê rojê min zarokên dibistanê zû şandin

8

malan. Heta derengî piştî nîvro jî vê xemgîniyê ez bernedam û her  
li ser  
min giran bû. Min xwest ko ez ji lojmana dibistanê, ji gundê X'ê  
derkevim  
û ji xwe re berî berî çêm bimeşim. Li axpîna paş malên X'ê, gundiye  
bi  
navê Berzo rastî min hat... bi min da zanîn ko ji dûr ve merivê we jî  
tê. Piştî  
ko min bêhtengiya xwe jê re got, ciwamêro ji hespê xwe daket,  
devgem  
da dest min û ji min re got:  
»— Heta zoman berî berî çêm biçe, bergehên gelekî xweşik hene.  
Li  
zoman bêhna xwe vede, dewekî cemidî vexwe û paşê vegere.« Piştî  
ko  
silavên xwe yê ji bo Apê Simko jî got, min berê hespê ber bi jor kir  
û min  
hajot. Bayekî buhara paşîn hêdî hêdî pêl dida. Çemê we î bi xof her  
tîşên  
wusa li çiyê xisti bû ko dema ez li ser piştta hespê di ber re diçûm  
tirseke  
mezin dikete dilê min. Li ser devên wan asêgehên bêbinî serê meriv  
gêj  
dibe û dilê meriv tê ber devê meriv. Her bergehên wusa xweş, wusa  
xweş  
li wan warên we koçeran hene ko meriv naxwaze bimire!... Jiyan bi  
meriv

xweş û şêrîn dibe. Dema min xwe gihand deviyên pêş zomên mala bavê te, xweşdengê bilûrê kete guhê min. Li pala hember colek mîhên mor di mexeliyê de bû. Bi kincên xwe yê rengoreng çend keç û jin di nava col de radibûn û rûdiniştin. Ez dû re têgêhîştim ko bilûrvan şivanê zomên mala bavê te ye. Li ser zinarekî hember rûnişti bû û hundurê xwe valayî bilûrê fikir, Xwedêyo!... Wê çaxê min di dilê xwe de got, »Heta ko ez li darê dunyayê sax bim, ev bergeha ê ji ber çavên min wenda nebe!«  
Jiyanê rengê xwe î veşartî rayê min dabû. Ez û şivên, em hatin zoman. Piştî ko bavê te î mêvanperwer bihîst ko ez mamostê gundê X'ê me, bi rewşa mîrekî mezin rûmeteke bilind da min, li ser kulavê xwe î nexşîn ciyek da min. Ramanê wusa bi min re çêbû ko li ciyên weha û di nav merivên weha de meriv baştir bi rûmeta xwe dihesê. Dû re jî bi zarekî xweş dûrûdirêj ji min re çêlî jiyana koçeriyê kir:  
»— Ci û warê me ne diyar e. Kuderê xweş be, em wir ji xwe re dikine war. Lê kesên bajarî jiyana me nas nakin...« digot û ew warê xwe ji min re



bi lêv dikir. Di wê gavê de ji nişka ve dengê marîna berx û mîhan hate

min. Min li ser piyê xwe î çepê nêhirî, bi wan dengên xwe yên xweş û

xemgîn berxên mor ji kozikan ber bi deviyên herikîn û dû re ketin nava

col. Ji van tiştên ko ew ê di jiyana min de, hertim di bîra min de bimînin

û ji ber çavên min wenda nebin, jê yek jî...

Li vir pişirînên bextiyariyê bi lêvên mamoste Kevanot dikevin, ew destê

xwe î ko êdî xwendevan jî pê dizane dîsa ber bi biskên koçera xwe dirêj

dike û didomîne:

9

— A jê yek jî, fîlikên vî porê te î kej bûn. Li hêla çepê kon li ber tirêjên roya li ber ava weke gîstîrên zêrîn diçirûskîn...

Tiliyên mamoste Kevanot hêdî hêdî xwe ji nava wan gîstîrên zêrîn berdidin ser gupa koçerê û bi kenekî bilind li gotinên xwe yên jorîn zêde

dike:

— A wê çaxê bû, rindika min! Ji xwe çî bû, wê çaxê bû. Ev çavên te yên

gir, dev û lêvên te! Xwedêyo!... Bergeheke wusa kûvî, wusa kûvî ko... Bi

nêrînekê re mîna ko yek xwîna vî dilê min valayî beroşekî bike û bide ser

terafa agir!... Aaa, wusa dikeliya...

Bi vê peyvika xwe ya dawîn re mamoste Kevanot wî destê xwe ber  
bi jor  
vedigire, hildikute, bi dîreksîyonê digire, dizivîrîne ser rêyeke piçûk,  
hus-  
tuyê xwe hinekî dirêj dike, li hawurdora xwe dinêre, vedigere ser  
koçera  
xwe, destê xwe ber bi hêla jêrîn bilind dike û:  
— Binêre va em hatin... em hatin Gundê Dînan, dibêje, ber bi  
koçera  
xwe dikene û didomîne: Ez ji xwe re henekan dikim... lê wusa  
dibêjin.  
Min jî ji devên xelkê bihîstiye... dibêjin, ev hemû gundên hawurdor  
jî vî  
gundê ha weke Gundê Dînan bi nav dikin. Lê ciyekî xweş e, pir xweş  
e!...  
Ava wî, rez û bîstanên wî, pîvazên... ha, ha, ha!... tu dizanî, Nêrgis?...  
dibêjin ko dînbûna şêniyên vî gundî, ji pîvazên wan e. Hinek jî  
dibêjin ji  
ava wan e. Ew mamostê ko heta sala çûyî li vir mamostetî dikir,  
beriya  
çend rojan ez û wî li bajêr rastî hev hatin. Îcar te bidîta!... ma çi ne  
digot  
ko... Meriv ewqas jî bêbext nabe!... qaşo merivekî xwenda ye!... ji  
min re  
digot:  
»— Bila ev temiya min li te be, Kevanot, bila hertim hefsarê şêniyên  
vî

gunda di dest te de be, zêde guhdariya wan neke, di ber devê wan re

nekene û rû nede wan. An ne... tu ê av û av biçî, bibî nola wan û tu ê jî

dîn bibî!...« Bi awakî wusa ji min re digot, mîna ko ez diçim û li tîmarx-

anekê karmendiyê dikim. Bi min wusa hat ko mêrik hinekî ji serê xwe

çelq bû, an ne mamosteyekî baqil tiştên wusa nabêje. Lê tişteki berbiçav

heye, sê roj berê dema ko min mal hanî çend xort û zarokên gund hatin

alîkariya min. hemû jî gelekî baş bûn. Erê min dê û bavên wan, an jî ji

rîsipyên gund kesek ne dît, ez zêde bi kesekî re ne peyivîm lê... lê min ji

hêminiya wan têderxist ko zarok ji merivên baş de ketine. Bi şêlek gendûgemar bûn lê hemû jî merva, baqil, bêdeng û hinekî jî nola te kûvî

bûn... ha, ha, ha!...

Bi vî kenê xwe re mamoste Kevanot cara dawîn jî destê xwe î bextiyar

bi gupa koçera xwe dike û bi tevgereke ewle:

10

— Ez baş dizanim ko em ê jiyaneke xweş li vî gundî derbas bikin. Tu tew xeman nexwe!... dibêje û kevnetexsiya xwe li ber dîwarê hewşa dibis-

tana Gundê Dînan radiwestîne.

Bi gurîna dengê texsiyê re weke hertim bala xelkê gund tê kişandin,  
bi  
rawestina wê re çend kes li hewşa dibistanê kom dibin, jin û bûkên  
gund  
di riya kaniyê de dema ko xwe digêhînin taxa deriyê hewşa  
dibistanê, ji  
wir, ji dûr ve li ser piyên xwe dizivirin û dinêrin, xwe bi xwe an jî ji  
hev re:  
»Mamostê me î nû hatiye, kewaniya wî jî pê re ye. Xwedê bike jina  
wî  
zarxweş be, ne nola wê rengdîna jina mamostê kevin be!« dibêjin.  
Ev hatina mamostê nû di wexteke kurt de li der û hundurê gund  
belav  
dibe, gelek gundî li ber dîwarê hewşa dibistanê berhev dibin û  
dibînin ko  
mamostê nû û kewaniya xwe bi zimanê malê dipeyivin, nizanin ko  
bûka  
koçer ji bilî zimanê malê bi zimanekî din nizane, ev yeka ha xwîna  
gundiyan bêtir li wan germ dike, mîna cotekî ji gundê wan be bi  
zimanê  
wan dipeyivin, astenga hevnasîne di navbera gundî û malbata  
mamoste  
Kevanot de namîne, hinek xort û zarok wan hûr û tiştên di paşiya  
kevne-  
texsiyê de dikêşin hundurê lojmanê, çend jin û keçên xwîngerm bi  
alîkarî  
mala bûka koçer rast dikin, çend mêrên gundî mamostê nû girtine  
nav

xwe û xêr û xweşiyê lê dibarînin.

Gelek nabuhure ro xwe dide ber ava, civata li dora mamoste Kevanot

feretir dibe, bi serê êvarê re, bêhna gund xwe dide der, dengê wajîna zarok

û ewtîna kûçikan, orîna dewar û zirîna keran li nav hev dikeve, bêhna şîv,

girar û nanê şewitî... di vê navberê de xwarin û pêxwarinên sala çûyî li van

deman dikeve bîra mamoste Kevanot, bi raman diçe gundê X'ê li wir

derdikeve serê zozanan ba koçeran, lê na, ne malên vî gundî weke konên

koçeran reş û ne jî xelkê vî gundî nola merivên wî navçeyî kûvî ne, momoste Kevanot bi dengê hişk û bilind li xwe divarqile:

— Erê keko, erê!... çima tu xwî dikî, keko?...

Ji civata dorê hinek serên xwe dixin ber xwe û dikenin, lê ji wê civatê yek bi mirûztirşî:

— De tu li min û li vî dînî binêre, ha! Dîsa bêhna dûmana cixarê dike!... dibêje û destê xwe li ba dike, du sê kesên din jî weke dengê wî dînî

- ev deng çî li hundur û çî li derve her bi tonekê ye- bersivê dide û dibêje:

— Na bavo, kes xwî nake, Guzî!.. ma çima tu xwî dikî, keko!

Mamoste Kevanot têngêhîje, tenê bala wî dikêşe ko yekî pêxas, berte-

na saqoyekî bêbetan û şalekî bi her babetî pînekirî, bi lez ber bi civatê tê

û navê wî Guzî ye, her ko nêzîk tê, neliheviya bergeha wî baştir diyar  
11

dibe, çend kesên ko ji vê tevgera wî nerihet dibin, ji civatê vediqetin  
û ber

bi Guzî diçin, diçin ko nehêlin ew xwe bigêhîne mamoste Kevanot,  
lê ew

rebena her:

— Ji te re çî, heyran!... çîma tu xwî dikî, keko!... dibêje û tê, ew  
kesên

ko ber bi wî diçin jî nikanin pêşiyê lê bigirin, Guzî heta ber mamoste  
Kevanot tê, destê xwe î qertûşî ber bi wî dirêj dike û bi dengê xwe î  
tay-

betî dibê:

— Erê!... tu bi xêr hatî, xoce!...

Mamoste Kevanot hinekî bi dudilî destê xwe dirêjî wî dike û bi  
pişirîn

dibêje:

— Xêrenderar bî, ezbenî.

Ji civatê dîsa dengê bilind dibe û dibê:

— Law de bicahime êdî, dîno!... Tu dîsa hatiye cixaran, ne wusa!...

Lê dîno xwe li ber mamoste Kevanot xweş dike û ji civata dorê re:

— Ji te re çî, heyran!... Çîma tu xwî dikî, keko! Erê!... Xoce dide min!

Ma ne wusa ye, xoce!... dibêje û bêyî ko gotina wî bête birîn, tiliyên  
destê

xwe î rastê ber bi lêvên xwe dibe, hustuyê xwe ber bi paş rep dike  
û

didomîne: Erê, xoce cixarekê dide min!... ma çîma tu xwî dikî,  
keko!...

ma ne wusa ye, xoce! Xwedê hewînî, ma ne wusa ye, xoce!...

Mamoste Kevanot têdigêhîje ko cixareyek jê tê xwestinê, bi kêfxweşî

destê xwe davêje bêrîka qutikê xwe, pakêtekê derdixîne, daxwaza wî bi cî

tîne û di dest de jî têdigêhîje ko Guzî ji serê xwe kêm e, lê bi qasî ko bi-

hîstiyê ne xeternak e, loma di dilê xwe de: »Dînên vî gundî jî xwînşêrîn

in.« dibêje, bêyî ko pakêta xwe têxe ciyê berê, li ser lingan keremî hemû

kesên dorê dike, ew pakêta nîvçe diqede, yeke nû derdixe û ji wê jî çend

liban belav dike, ji bilî cixarekêşan hinekên ko cixarê nakêşin jî dibin xwedîparên pakêta wî.

Mamoste Kevanot dîsa bi çavekî lêkolînerane li civata dora xwe dinêre,

bi şermokî, bi dijwarî:

— Li min biborin, dibêje, mîna ko hûn jî dizanin mala min anuha tevlihev e. Divê ez biçim û cî bidime tiştan. An ne, me ê bi hev re çayek...

Çend deng bi hev re bilind dibin û dibêjin:

— Em biçin mala me, xoce... îşev...

Lê dengê Guzî ji wan dangan bilintir dibe, peyva civatê dibire, hilmên

dawîn li cixara xwe dixê, dûyê wê di dev û pozê xwe re berdide, li dengê

xwe î bilind zêde dike û dibê:

— Erê!... em ê çaya xocê jî vexwin!... ma çima tu xwî dikî, keko! Xocê  
12

me comerd e!...

Ji civatê dengekî din li Guzî tûj dibe û dibê:

— Werim, ez ê te bidim binê lingên xwe, ha!... Dîno!... de zû ji vir  
bic-

ahime, ehmeq!...

Li ser van tevgerên gundiyan, dev li mamoste Kevanot vekirî dimîne  
û

dilê xwe bi wan dişewitîne, li hêla din jinên gund bi bûka koçer de  
ketine

ko wê bibine malên xwe, lê ne mamoste Kevanot û ne jî jina wî vê  
daxwaza gundiyan dipejirîne, di dawiya dawîn de bi sipasî û  
kêfxweşî dilê

gundiyan digirin û wan dişînin malên wan, heta gund di rê de çî ji  
devên

jinan û çî ji devên mêran, pesinê mala mamoste Kevanot bi lêv dibe.

Bi êvarê re mamoste Kevanot û Nêrgisa koçer malhaziriya xwe ya  
koç-

maliyê datînin ber xwe û dest bi xwarinê dikin, ji hêlekê ve dixwin  
û ji

hêlekê ve jî qala başiyên xelkên gundî dikin: Xwînşêrîn in, xwîngerm  
in,

baş in, merva ne, şorgerm in... di vê navberê de derê eywana  
lojmanê

lêdikeve, herçiqas xelkên gundî baş û şorgerm bûya jî, di vê êvara  
pêşîn de



ne dibû ko kewaniya malê biçûya derî vekira, mêrê malê radibe ser  
xwe û

diçe derî vedike, du jin li ber derî rawestiyane, hêkerûn, tirşik û ew  
girara

ko bi qasî du saetan berê bêhna xwe dabû der, anuha li ber deriyê  
lojmana

wî ye, mast, qeymax û nivîşk jî li ser destên wan sipê dixuyin, bi  
ruyekî

şermesar dengê ji mamoste Kevanot derdikeve û dibê:

— Ev çi ye?... çi hewce ye?...

Ji jinên ber derê lojmanê yek dibê:

— Na, na... wî... ma çi ewka wê heye?

Ji wan jinan ya din:

— Li me biborin, dibêje. Bi Xwedê me hay ji hatina we tune bû. Erê  
digotin, lê me nizanî bû ko hûn ê îro werin.

Bi dengên jinan re Nêrgisa koçer derdikeve ber derî, mêrê malê  
pêşiyê

naxwaze wan tiştan bigire, lê dû re dibîne ko du sê reşên din ber bi  
deriyê

lojmanê tîn, di destên wan de jî tiştên xwarinê hene, jinek û du  
zarok in,

ramanek di serê mamoste Kevanot de vedijine ko hatin û rastkirina  
malê

dereng ketiye, gundiyan zanîne ko wexta wan û çêkirina xwarinê ne  
bûye

û loma wan ev tiştên xwarinê hanîne.

Di nava xwarinên îşevîn de ji wan re qûfikek hermî û tiriyê reş jî  
hatiye,

piştî şîvê tînin wan jî didin ber xwe, mamoste Kevanot ji hêlekê ve tiliyên

tirî davêje devê xwe û ji hêlekê ve jî dibêje:

— Ma tu dizanî, Nêrgis... ev xelkên gundî ji yê bajarî comertir û mer-

vatir in. Dilê wan germ û.... germ û paqijtir in. Ko meriv li wan xwedî  
13

derkeve û bi zimanê wan bipeyive, ji meriv re dibin... dibin erd. Lê...  
Li vir mirûzê xwe tirş dike, tiliyek tiriye din jî ji gûşî diqetîne, beriya  
ko

bavêje devê xwe wan peyvên xwe didomîne:

— Lê... nezan in, kwîrfam in. Serê wan hişk û hişê wan zû bi zû di  
ber

tiştan de naçe. Bextê wan mîna vê tiliya tirî reş hatine nivisîn,  
dibêje, wê

tiliya tirîye reş di devê xwe de datîne û dipelixîne.

Weke zarokek li ber şîretan serê Nêrgisa koçer di ber de ye û carina  
ew

jî ji gûşî tiliyan diqetîne, di dest xwe de pê dilîze û dû re di nava  
lêvên xwe

de datîne, di vî warî de xwe bi kêrî peyivîne nabîne ko ew jî tişteki  
bibê-

je, heta nuha jî Nêrgisa koçer berpirsiyariya galegalên dîrûdirêj ne  
girtiye,

hertim bi zimanekî kurt beşdarî şorgermiya mêrê xwe bûye, di  
mijarên

evîn û bextiyariyê de hertim ruyê wê soromoro bûye.

Bi derengê şevê re zik li mamoste Kevanot têt dibe, bi hêviyeke mezin

li ruyê Nêrgisa koçer dinêre û dibêje:

— Lê em ê li vir jiyaneke xweş li dar bixin, Nêrgis. Em ê bi xelkê gund şêrîn û ew ê jî ji me xweş bin. Ez mamoste me. Ne tenê mamostê zarokên

wan, herweha ez ê mamostetiyê ji wan re jî bikim. Ez sond dixwim ko ez

ê bi her awayî ji wan re bibim alîkar. De êdî çî ji destê min biqede ez ê

bikim. Dibêjin gelekî wan heta nuha ruyê bajêr jî ne dîtine. Gund bi xwe

gundekî avî, xweş û şên e.

Herdu mêvanên vî gundî bi peyv û gotinên weha şeva xwe pîr dikin, ji

bo xewa şeva pêşîn dikevin nava nivînan û bi bextiyarî li hev dipiçikin.

14

— Berdin ha, berdin! Berdin, naxir diçe ha!..

Piştî du sê bawîşkên sibê, mamoste Kevanot bi vî dengê gavanê gund ji

nivînan radibe, ber bi pencerê diçe, li dîmena gund dinêre, Nêrgisa koçer

ji zû ve şiyar bûye, li ser kaniya hewşa dibistanê avê dikişîne û ew jî cari-

na li bergeha vî gundê nû temaşe dike, gundyên ko dewarên xwe rastî

naxirê dikin qîrewîra wan û heywanan li nav hev dikeve, çend keç û

bûkên gundî li ser kaniya kêleka dibistanê li hev sekinîne, gavan li berwarê goristana gund dewarên hatî li hev dicivîne û her bi wî dengê

xwe î bilind diqîre:

— Berdin ha, berdî naxir diçe!

Mamoste Kevanot pencera lojmanê vedike, bayekî payîza pêşîn li ruyê

wî dixê û dilxweşiyê bêpîvan di xwe de hîs dike, bi gavên mamosteyekî

bextiyar ber bi derê eywanê diçe, şekalên xwe bi ser lingên xwe ve dike, bi

bertena pîjamê xwe derdikeve hewşa dibistanê, li ser kaniya dibistanê li

dîmena gund, gundî, goristana hember dinêre, mîna ko destpêka jiyaneke bextiyar ji nuha ve bi wî ve xuya bibe, ber bi Nêrgisa koçer dip-

işire, li ser riya kaniya gund, li axpîna tenîştê û di riya rezan de gundî li

hewşa dibistanê dizivirin, dinêrin, ji peyayên gundî hinek ji dûr ve silavê

li wî hildidin û bi vî awayî xêrhatinê lê dikan, du jinên gundî dane ser riya

dibistanê û tîn, nêzîktir dibin, tev xwarinên sibê heta ber derê lojmanê

tîn, mamoste Kevanot çav li wan dikeve û bi matmayîn dibêje:

— Ev çi ye?... bi Xwedê ev tevgera we naxoş e. Ma qey mala me jî mal

e û me jî xwarin û vexwarin heye. Me hemû tiştên xwe bi xwe re hanîne...

— Bila xoce, bila, dibêjin, xêr û xweşiyê li hatina wan dibarînin û bi van gotinên xwe re çav li jina wî dikevin, mamoste Kevanot derbasî hêla

hundur dibe, hersê jin li hev disekin, li hev dipirsin, xêr û xweşiyê li hev

dikin, dû re ew xwarinên sibê di dest Nêrgisa koçer de dimînin û jinên

gundî dîrdikevin.

Taşê di lojmanê de tê xwarin, mamoste Kevanot xwe tevgirêdide, derdikeve hewşa dibistanê, ro bi sê çar qaman bilind bûye, ji ser sipîndarên kêleka dibistanê, li paş wan sipîndaran ji ser darên Mekanê Mala

Dînan, ji dar û kevirên hawurdor dengê çûçikan bilind dibin, ji zeviyên

15

dûr cirecira dengê bihukan tê bihîstinê, ji bilî çend zarokên ko li ber dîwarên hewşên malên gund dilîzin kesek bi ber çavan nakeve, herkes

mijûlê karûbarê xwe î payîzê ye.

Di vê navberê de li paş malên gund, kalekî riyê wî sipî û dirêj daye ser

riya dibistanê û ber bi jor tê, her ko ber bi dibistanê tê û nêzîktir dibe,

bêtir jî diyar dibe ko kalekî salmezin e, lê di rêveçûnê de ewqasî nade

xuyakirin, mîna ko ne ji bo alîkariyê lê tenê ji bo nîşana pîrbûnê  
gopalekî

Kevin î xweşik di dest pîremêr de ye, hîn ji dûr ve bi dengê  
salmezinekî

silaveke xêrhatinê li mamoste Kevanot dike û nêzîktir dibe,  
mamoste

Kevanot ji hewşa dibistanê derdikeve, diçe destê wî digire û  
xweşhaliya

xwe dibêje, herdu jî li wir li hêla der li ber dîwarê hewşa dibistanê  
rûdinin,

beriya ko bi hev re têkevin galegalan an jî ji bo ko têkevin galegalan  
mamoste Kevanot bi tevgereke giramgîr berê xwe bi pîremêr de  
dike û

dibê:

— Navê te bi xêr, sofî?

Pîremêr cî li xwe xweş dike, bi çavekî dostane li mamoste Kevanot  
dinêre û bêyî ko çavên xwe jê bikute, dibêje:

— Xwedê te bihêle!... navê min Sêvdîn e, Sêvdînê Selîm... ji min re  
dibêjin, sofî Sêvdîn.

— Navê min jî Kevanot e, sofî.

— Sitara Xwedê li ser te be!... tu ji kîjan eşîrê î, xoce?

Kevanot bi giramî û bi zanebûna mamosteyekî dibêje:

— Eşîra me ne maye, sofî. Di jiyana bajarvaniyê de pîvanên wusa  
wenda bûne êdî.

Mîna ko sofî Sêvdîn dilê xwe jî bi rewşa îroyîn bişewitîne bi  
keservedan

di ber xwe de dibê:

— Her ko diçe dunya piçûk dibe û civak jî dibe weke nokên tahtê.

Dilovaniya dem û dewranê ne maye êdî!

Ji bo kêfxweşiya sofî Sêvdîn, mamoste Kevanot dengê xwe jî hinekî bilind dike û dibê:

— Maşallah te gelek sal derbas kirine, sofî.

Sofî bi rûkeniyeke şêrîn lê dinêre, destê xwe î vala davêje riyê xwe î mî-

na hirî, çavên xwe bi hev de dikute û:

— Êê... dibêje, ez jî kê m ne jiyame. Xwedê baştir dizane... lê bi qasî ko

ez dizanim... li vê dunyayê min jî xwe bi qasî sed û bîst salan kevin kiriye...

Mamoste Kevanot:

16

— Maşallah!... Xwedê jiya te dirêjtir bike, sofî!... dibêje û di dilê xwe de

didomîne: »Sed û bîst sal jî ne hindik e.«

Sofî Sêvdîn destê xwe dide ser çogên mamoste Kevanot, ditepîne û dibê:

— Xwedê te bihêle!... Xwedê jiya te ji ya min dirêjtir bike!

— Maşallah!... tu hîn jî li ser xwe î, sofî.

— Ê... Xwedê bi ya xwe dike. Hertîşt di destê wî de ye, dibêje û mîna ko sofî Sêvdîn van gotinên xwe jî bipeyitîne, vê carê destê xwe ber bi

goristana hember radike û bi keservedan didomîne: Gelek meriv di pey

min re hatin û berî min çûn... çûn û xwe li vê palê ramedandin.

Dema

bavê min li vir cîwar bû, weke anuha tê bîra min, çend malên Mala

Dînan li wê hêla kaniyê, li berwarê vê goristanê hebûn. Miriyê xwe dibirin bi qasî çar werîsan ji malên xwe dûr, di nava daran de dikirine erdê. Ji ser vê kaniyê, heta piştta çiyayê jorîn darên kelberû di nav hev de bûn. Hêla jêrîn jî wusa... nêçirvanekî herî dilêr jî newirî bû bi roj di nav re derbas bibûya. Ev geliyê ha bi daristaneke kûvî hati bû nixumandin. Lê ka?... - herdu destên xwe vedigire û li dora xwe mêze dike- hemû birîn, kirin erd û hajotin. Bi xêra ruhê pîrozwer re çend dar li vê piştê mane... ne min got, di demên me de dunya mezin û xalî bû. Ciyê herkesî û her-tiştî tê de hebû. Meriv dikanî bû bi neviyê neviyê xwe re, li ciyekî, di hewşekî de bijiya. Lê anuha?... Mamoste Kevanot bi çavekî lêkolîner li vî pîremêrî dinêre û dibîne bê çî porê ko bi serê wî ve maye, çî pirça li dora hustuyê wî î qermiçî û çî mûyên li ser zenda wî, giştik jî weke hirîyeke şûştî sipî bûye, mîna ko di qermiçên eniya pîremêr de hunera jiyanê, nexşên dîrokê bibîne, di xwe de: »Ser û binê vî gundî, ez ê bikani bim ji vî pîremêrî hîn bibim, rasterast ferhengek e, ferhengeke dewlemend e.« dibêje û bi mereqdarî ji



ferhenga dewlemend dipirse:

— Ma hûn ne ji vî gundî bûn, sofî?

Dema ko pîremêr dibîne guhdarekî dilsoz heye, daxwazeke peyivînê li

wî jî radibe ko wan hemû demên xwe yên buhurî rûpel bi rûpel veke, bi

xwînegoşt bike û wan ji nû ve bijî:

— De wê çaxê jî gund tune bû ko... ne min got... Mala Dînan bû. Ew jî bi tevayî çend mal bûn. Dema em ji Serhedan daketin, bavê min çû bû

li ser kulavê Sofî Dîno rûnişti bû. Sofî Dîno, mezinê wan malan bû.

Merivekî saxik û dilpak bû. Tabilê bi bavê min re bû bû destbirak û ne

xwesti bû ko bavê min bi şûn de derkeve Serhedan.

Mîna ko tişteke bala mamoste Kevanot bikişîne an jî tişteke nû têkeve bîra wî, pirseke din ji pîremêr dike:

— Ev navê ha... navê Sofî Dîno, kê li wî kiri bû?

Pîremêr herdu destên xwe ber bi jor vedigire û mîna ko bi xwe jî nikani

be ji nav derkeve, dibêje:

— Bi Xwedê... di wan deman de em zarok bûn, lê li gor tiştê ko ez dizanim, ev navê ha ne navê wî yê rastîn e. Ji ber tevgerên wî yên nexşîn

ji malbata wî hinek rabûn ew bi rengdêra »dînitîyê« navandin û hinekan

jî ev rewşa wî weke »sofîtiyê« bi nav kirin. Herweha navê wî jî ma Sofî

Dîno. Lê piştî çend nexşên wî, jê tirsîyan, paşîngê li ser vî ruhê pîrozwer

ketin dudiliyekê û dû re jî gêhîştin wê baweriyê ko ne merivekî vala ye.

Mereqdarî li mamoste Kevanot tîrtir dibe û dibê:

— Sofî, heyran!.. li gor nexş û kerametên çawa ev navê ha... ev navê ha

li wî kirin?

— Ne min got... di destpêkê de navnotî bi dû ket û digotin: xerifî ye...

Rihma Xwedê li ruhê wî yê pîrozwer be, digotin... de wê çaxê em zarok

bûn û me hay ji tiştên weha tune bû... lê digotin, di dawiya jiyana xwe de

evîndarê bûka xwe bû bû û ji dû wê venediqetiya. Digotin, wê çaxê kurê

wî gelekî şerm kiriye, xwe havêtiye dest û lingên wî ko ew dev ji vî xwiyê

xwe berde. Lê ne bûye... ev xwiyê ha ji ser ne çûye. Evîneke asimanî girti

bûye ser. Ji ber vê yekê... ji şevan şevreşeke buharê kurê wî ew li hespê

kiriye ko bibe Şikefta Zoncikê... meriv nizane ka êdî kurê wî çi fikirîye...

lê li gor gotina jina kurê wî, li nêzîkî devê şikeftê du aferîdên seyr hatine

pêşiya vî kurê wî û jê re gotine:

»— Ko tu wî tiştê di dilê xwe de bikî, em ê tiliyên xwe di çavên te re

bikin!« Xwedê dizane bê êdî çî di dilê kurê wî de bûye... Wê şevê  
kurê wî

bavê xwe bi şûn de tîne malê û herdu jî dikevin nîvênên nexweşiyê.

Û di

wê şevê de, di wê nexweşiyê de kurê wî radibe vê bûyerê ji jina xwe  
re kat

dike û bi destê sibê re jî dimire. Amentubîllah, karê Xwedê nexşîne!  
e!...

Dema şênîyên van çend malan cendekê kurê wî hilanîn, Sofî Dîno di  
nivînan de bû. Ji xwe heta ko mir jî ji nivînan ranebû. Rasterast sê  
mehên

dawiya jiyana xwe di nivînan de buhurand. Di ber mirinê de... De  
îcar çî

mirin bûye, Xwedêyo!... Mirineke asêwarî! Em wê çaxê zarok bûn...  
bavê

min... rihma Xwedê li hemû miriyan, li wî jî be!... bavê min wê çaxê  
li paş

serê wî bûye. Çêlî mirina wî fikir û digot:

»— Bayekî eyûbî lê rabû bû.« Li gor gotinên ko bavê min digot, Sofî  
Dîno rabûye kincên xwe çirandîye, xwe deverû havêtiye erdê, mîna  
Eyub

18

Î pêxember wî jî gotiye:

»— Ez ji kezeba diya xwe şilfûtazî çêbûm û divê ez şilfûtazî jî  
vegerime

wir!« Wek ko min got, dû re jî gelek şirove hatin kirin û gotin: Ev  
ruhê

ha, ruhekî asimanî ye.

Ji rojên dibistanê roja pêşîn e, hemû gundiyan hay ji hatina mamosteyekî nû bûye, ji herkesî re hatiye gotin ko îro dibistan ê vebe, bi germebayekî sibeha payîza pêşîn re royê hîna nû xwe ji paş çiyar havêtiye der, dar û berên li dora gund, rezên li pêşberê gund pelên zer li xwe xistine, rengê kêfxweşî û xemgîniyê li nav hev ketine, ji bo vê roja pêşîn mamoste Kevanot xwe tevdipêçe û hinekî zû ji lojmanê derdikeve hewşê, bi rêveçûneke bextiyar ber bi kaniya dibistanê dimeşe, li wir mistek ava cemidî vedixwe, ji xweşbûna dîmena gund lêvên xwe bi hev de dişidîne, bi poz bêhneke dirêj dimije û dikişîne hundurê xwe, çi bêhneke xweş!  
 Ji bilî gironek û benzîna kevnetexsiya wî ya li quncikê hewşê hertişt xweşbêhna gundekî dide, bi gavên hêdî ber bi deriyê dibistanê diçe, derî vedike û dikeve hundur, di dilê xwe de: »Ca ez baş binêrim... binêrim ka çi xwendekar hene.« dibêje û deftera dersxanê ji çavika masa mamostetiyê derdixe, tîne rûpel bi rûpel diqelibîne û dibîne, dibîne ko tevayiyê dibis-tanê bîst û heft xwendekar in, jê bîst û yek law û şeş jî keç in, li gor deftera

salên berê, zarokên dibistanê bi du beşan ciyê bûne, dersxana yek, dudu, sisê û dersxana çar û pêncan e, mamoste Kevanot dîsa di dilê xwe de: »Ne zêde ne. Ji bo hîndayîneke baş, ez ê bi kêr werim.« dibêje, weke mereq-dariya her mamosteyekî nû ew jî dixwaze bizani be ka di şemayên ders-dayînên salên buhurî de çi hene, di van şemayan de dibîne ko mamostê salên buhurî ji serî heta dawiya deftera rojane bi tiştên monoton dagir-tiye: xwendin, navê demsalan, matematîk û hwd. Mamoste Kevanot xwe bi xwe: »Ne neheq in ko pirî caran gazinan ji van qeşmerên mamostên gundan dikin. Ew jî dizanin ko zû bi zû riya mufetîşan bi van deveran nakevin loma. Kî dizane bê li van gundên we-ha xalî mamostetiyeke çawa dikin. Lê em ê dû re, piştî du saetên din binêrin bê zarok çiqasî fêrî tiştan bûne.« dibêje, wê deftera ha li ser masê vekirî dihêle û berê xwe dide derve. Du zarokên law li ber dîwarê hewşê rawestiyane, çer ko çav li mamostê xwe î nû dikevin, xwe hinekî ji cî dilivînin û dixwazin rengê xwendekarên şariza li xwe daynin, beriya ko mamoste Kevanot bi van xwen-

dekarên xwe yên şariza re bipeyive, bala xwe dideyê ko sofî Sêvdîn,  
20

pîremêrê ko do li ber vî dîwarî pê re peyivî bû, bi piyê keçikek piçûk  
gir-

tiye, ber bi dibistanê li pey xwe kaş dike û tê, keçik bi awakî birîndar  
di-

girî û sofî Sêvdîn jî bi rewşeke tevlihev e, mamoste Kevanot bi  
mitûmatî

û bi gavên dudilî ber bi wan diçe, ji nişka ve tirs û berpirsiyariyeke  
tevli-

hev xwe lê dide der û nizane bê çi bûye, birîna destê keçikê ji dûr  
ve xuya

dibe, lê heta ko nêzîkiyê lê dikin jî mamoste Kevanot têngêhîje bê  
birî-

na çi ye.

Pîremêr ji dûr ve:

— Ez di bextê te û Xwedê de, xoce! dibêje û pê dide zanîn ko mar  
bi

destê keçikê girtiye, ev peyva mar mamoste Kevanot diveniciqîne,  
di-

tirsîne, şewatekê bi dilê wî dixîne, lê dîsa jî dest û hişê wî lê giran  
nabe,

zûzûka xwe bi keçikê digêhîne, zenda wê digire, dişidîne, bi peyv û  
he-

vokên nîvçe deng li pîremêr dike û dibê:

— Lez bike, sofî!... lez bike, ji dora pêşa wê paçekî... zû paçekî  
biçirîne!...

Pîremêr lez dike, kêreke dudevî ji ber pişta xwe derdixe, xwarî  
fîstanê  
keçikê dibe, di ber pêşa wê re bi qasî sê tiliyan berwar jêdike,  
mamoste  
Kevanot bi qasî bihustekê ji bîrîna devê mar dûr zenda keçikê bi wî  
paçî  
hişkfirî dipêçe:  
— Çi bû... kengî bû?... dibêje, keçikê dide ber hemêza xwe û ber bi  
kevnexsiya xwe dilezîne:  
Pîremêr dide pey û bi pilelpil dibê:  
— Ma tu derdê van zarokan nizanî, xoce!... kevir û qul namîne ko  
destê  
xwe tê re dikin... qurmiçî!... belqitiya belqitî!... çûye destê xwe di  
qula  
dîwêr re kiriye... mar pê vedaye... belqitî, nerind!...  
Ji dest û tiliyên keçika belqitî heta girika piyê wê teviziye, êşeke  
giran bi  
tevayiyê laşê wê girtiye, gwînê wê zer û çavên wê li xewê ne, weke  
çêlçûkekê sivik û bêhiş e, mîna ko ji hevîrekî mesîhî hati be çêkirin,  
li  
hemberî rewşên weha hertim ruhê mamoste Kevanot tê guvaştin,  
ko yek  
jê re çêlî şikencê bike, li kuderê û bi çî awayî dibe bila bibe, ew wê  
êşa  
şikencê di xwe de hîs dike, ko tengasiya yekî bibîne, diwariya wê  
ten-  
gasiyê tavi lê li ruhê wî jî peyda dibe.  
Anuha jî êşa vê keçika piçûk di xwe de hîs dike û di dilê xwe de:

»Xwedê!... ev civakên gundan, çi bi qahr û qotik in!... ev dergûşa  
heyşt-  
sale û mar! Xwedê dizane bê anuha ev dergûşa reben di çi êş û  
azarê de  
ye!...« dibêje, bi wê lezê deriyê kevnetexsiya xwe vedike, pîremêr  
derbasî  
hundurê wê dike, keçikê di hemêza wî de bi cî dike, vedigere deriyê  
hêla  
21

din, motorê li kar dixîne, ji gund, ji dibistanê dûrdikeve û heta ko  
gure-  
gura kevnetexsiyê wenda dibe jî, ew herdu xwendekarên şariza her  
li pey  
dinêrin.  
Heta danê êvarê jî zarokên gund li hewşa dibistanê dilîzin, dikine  
qîre-  
qîr û li bendî hatina mamostê xwe î nû ne, nîvro dişikê, tîna royê  
sivik  
dibe û hêdî hêdî hênikayî dadigire ser naturê, dema ro xwe digêhîne  
ber  
ava, dengê kevnetexsiyê ji jor de tê bihîstin, gelek nabuhure  
mamoste  
Kevanot, keçika piçûk û kalê wê li ber dîwarê hewşa dibistanê ne,  
çend  
zarokên ko hîn ji bo dersa roja pêşîn li wir mane, mamoste Kevanot  
wan  
jî dişîne malan, tev keçika piçûk û kalê wê derbasî lojmana xwe dibe.



Mamoste Kevanot keçikê li aliyekî odê dirêj dike, ciyekî rûniştinê  
keremî pîremêr dike, derbasî hêla aşxanê dibe û amadekirina  
çayekê ji ke-  
waniya xwe dixwaze, dû re çend şekirên di nava kaxizên xweşikê de  
tîne,  
li ber keçika piçûk rûdine û hêdî hêdî bi wê re dipeyive:  
— Zenda te dêşe?... dibe ko anuha pir neyêşe, lê wexta ko êşiya tu  
bibê-  
je, em derman bidine te, a bila ev şekirên xweşik jî ji te re bin.  
Keçika reben bi destê xwe î sax şekirên xweşik digire, ber bi hemêza  
xwe  
dibe û bi kêfxweşiyê zarokane di bin çavan re li mamoste Kevanot  
dinêre, xweş diyar e ko keçik ji vê tevger û dilovaniya wî matmayî  
ye,  
merivekî wekî mêvan an jî nenas ew li makînekê siwar kiriye,  
hajotiye,  
dûr biriye avahiyeke nenas, ew hemêz kiriye, anuha li mala xwe  
daye  
dirêjkirin û tew şekirên xweşik jî dane wê, keçik di ramanên xwe  
yên  
piçûk de van hemû tiştên ha dipêve û hay ji êşa zenda xwe jî tune.  
Ev tiştên ko keçika piçûk di ramanên xwe de dipêve, di serê kalê wê  
de  
jî dilivin, Xwedê dizane ew jî dide ber hev û dide ser hev, lê tiştêkî ji  
hev  
dernaxîne, gerçî do dema li ber dîwarê hewşa dibistanê li halê wî  
pîrsî bû,

pê re keti bû galegalê, ew wê çaxê tégêhîşti bû ko ev mamostê ha  
nef-

spiçûkekî maqûl e, lê dîsa jî hişê wî nagire ko karmendekî mîna  
mamoste,

çawa bi gundiyekî wekî wî re dikeve têkiliyeke wusa germ, bêguman  
ji

ber vê yekê ye ko dema mamoste Kevanot berê xwe dide wî û jê re:  
— Baş bû ko di dest de serom gîhandin keçika reben, an ne... ew ê  
gelek

nebaş bibûya, dibêje, mîna ko hişê wî li dereke din be pîremêr  
bersivekê

li wî venagerîne û ev, ev yeka jî xweş dide xuyakirin ko ev cara pêşîn  
e

pîremêr rastî karmendekî wusa dilovan tê, ne tenê keçika piçûk û  
kalê

xwe, herweha gundiyên vî gundî jî, lewra piştî vexwarina çayê û  
kurte-

peyvîneke li ser dermanên keçika piçûk, pîremêr ji mala mamoste  
Kevanot derdikeve û tev keçika piçûk berê xwe dide malê, hîna di  
riya

22

malê de gundî pêşiyê lê digirin û dipirsin, tiştê ko dipirsin, ne rewşa  
keçi-

ka piçûk e:

— Me bihîst ko mamostê nû hûn li makîna xwe siwar kirine... hûn  
birine bajêr... çi mamosteyekî nefspiçûk e! Dilovanekî paqij e...  
dibêjin,

her cara ko jin an jî mêrekî gundî di kuçê de rastî pîremêr tê û bi vî awayî

çêlî mamoste Kevanot dikin, li gor xwiyê gundiyeke pîr ew jî du ewqasî

din lê zêde dike û pê pesinê mervatiya mamoste Kevanot dide, bi vê

pesindayînê re pîremêr xwe jî serbilind dibîne ko bi karmendekî re ewqas

nêzik ketiye danûsitendinê, çûye mala wî û li wir çayek jî vexwariye.

Wê şevê di her kuçê û her maleke gund de bêguman ev dilovanî û başbûna mamoste Kevanot bi lêv dibe, tew hinek firqûz û çavnebar baw-

er jî nakin, di nav xwe de an jî di dilên xwe de dibêjin:

— Dibe ko mamostê nû soza kavirekî ji sofî Sêvdîn î pîremêr girti be, an jî sofî nangermî kiri be ko bi wî re pêwendiyên xwe xweş bike!

23

Dotira rojê hemû zarok hatine û li gor saloxdana deftera dersxanê mamoste Kevanot ew bi cî kirine, tevayiyê dibistanê ji çaviyeke mezin

pêk hatiye, ji dersxana yekê heta ya pêncan hemû zarok di vê çaviyê de ne,

lê masên zarokên her dersxaneyekê cuda cuda ne, bi gotineke din her

maseyek dersaxaneyek e, dersxanên bê derî û bê pencere, ev jî ji bo

mamoste Kevanot tiştê rihet dixuye ko ji çaviyekê nebeze çaviyeke din.

Diyar e ko hemû zarok jî di van du rojên dawîn de başî û dilovaniya mamoste Kevanot bihîstine, bi mereqdarî û bi çavên ko dilovaniyekê

bipên li mamostê xwe dinêrin, beriya ko mamostê wan li ber masa xwe

rûne li ser textê reş navekî dinivisîne, vedigere ser wan:

— Navê min, Kevanot e, dibêje û diçe li ber masa xwe rûdine, hinekî li deftera dersxanê dinêre û dû re yek bi yek dest bi xwendina navên xwendekaran dike:

— Gurgîn.

Dengê zarokekî ji quncikekî dawîn berz dibe:

— Belê!

— Koko.

— Belê!

— Bodê

Ji xwendekaran yek:

— Ne hatiye, dibêje.

— Bengîn.

— Belê!

— Demo.

— Belê!

— Beşîr.

— Belê!

— Zînê.

— Belê!

— Zoro.

— Belê!

— Xerzî.

— Belê!

— Mîto.

— Belê!

— Dilşa.

Ji nava zarokan dengekî derengketî bi mamostê xwe dide zanîn ko mar

pêvedaye û loma ne hatiye, li vir mamostê wan keserekê vedide, hinekî

disekine, bêyî ko tişteki bibêje xwendina navan didomîne:

— Rewşen.

— Belê!

— Mem.

— Belê!

— Aram.

— Belê!

.....

Piştî xwendina hemû navan mamoste Kevanot radibe ser xwe, du sê

caran di dersxanê de, di nava masan de diçe û tê, bi çavekî lêkolînerane

hemû zarokan dadiwerivîne û xwe bi xwe: »Zarokên jîr in. Di peyivîna

xwe de ne kûvî ne. Weke zarokên civakên şareza bê tirs û bê şerm dipeyivin.« dibêje û bi vê gumana xwe re bi dengekî nizim didomîne:

— Zarokno, beriya ko em dest bi dersên xwe yên îsalîn bikin,  
dixwaz-

im ji we re çêlî tiştêkî bikim. Bila dersa me ya pêşîn jî ev tiştê be...

tiştê ko

di pirtûkên we de tune. Ango di pirtûkan de bi şêweyê ko hûn  
têbigêhîjin

tuneye, şirove nake û nabêje... nabêje ko meriv destên xwe di  
qulikên

sînokan re nakin. Ez ê werim ser Dilşayê. Ez bawer im hûn hemû jî  
pê

hesiyane. Do destê xwe di qulika dîwarekî re kiriye, dû re jî... dû re  
jî mar

pêvedaye. Ez nizanim bê çima meriv destên xwe di qulikên dîwaran  
re

dikin!...

Ji rêza dawîn dengê berz dibe û dibê:

— Ez dizanim, mamoste.

Mamoste Kevanot li xwediyê deng dizivire û dibê:

— Tu çi dizanî, Koko?

Mîna ko Koko ji gotina xwe poşmam bibe, hinekî divenicîqe lê dîsa  
jî

ji ciyê xwe radibe û dibêje:

— Ez dizanim bê çima destên xwe di qulikan re dikin.

Mamoste Kevanot bi dengêkî wusa çima dibêje ko Koko biwêre  
mereqdarîyên zaroktiya gundan ji wî re bi lêv bike, li ser vê yekê  
Koko pê

dide zanîn ku: ew destên xwe ji bo girtina çêlikên çûçikan di qulên  
dar û

dîwaran re dîkin, hêkên wan derdixin û pê dilîzin, tew carina ji bo  
kêfxweşiyê hêlînên çûçikan ji hev dixînin, ne tenê çûçik, herweha  
ew bi

şev jî dadikevine newalan, bi beqan digirin, lingên wan bi hev ve  
girê-

didin û li ser sêrî darde dîkin, bi ro li nav erdan kûsiyan berhev dîkin,  
bi

kevîrên mezin lê dîxin, dikujin, perçe dîkin, bêrika wan jê derdixin û  
ji

diya xwe re dibin.

Dema ko Koko van nexşên zaroktiya gund bi lêv dike, pirça laşê  
mamoste Kevanot lê pij dibe û devê wî ji hev dimîne, lê di vê gotara  
Koko

de tiştê bala wî dikişîne, di hişê wî de diçe û tê, loma li Koko  
vedigere û

bi awayê naşiyekî ko bixwaze guhdariya tiştên seyr bike, dibêje:

— Bêrika kûsî?... çima zarok bêrika kûsî ji diya xwe re dibin?... ew çi  
ye?

Koko î ko xwendekarê dersxana pêncan, mezintirê hemû  
xwendekarê

dibistanê, caris û nerindê gund e; anuha mîna şêwirmendekî piçûk  
û

zana di dersxanê de ji mamostê xwe yê mereqdar re van tiştên seyr  
kat

dike:

— Bêrika kûsî... dibêje, çavên xwe li ser zarokên dora xwe digerîne,  
li  
ser girika piyê yekî tişteki mîna gulikekê dibîne, ji ciyê xwe diçe wir,  
bi  
tiliya xwe tişteki pêşan dide û didomîne: A bêrika kûsî ev e.  
Mamoste Kevanot bi wê mereqdariya xwe ber bi wî zarokê diçe û  
dibîne ko ji risasê perçekî piçûk, kespikê, du pelikên zêrîn,  
moriyeke  
hespan, ji paçikêki kesk nivîşteke piçûk, darikêki duneçel û perçek  
hes-  
tiyê sêgoşe; hemû bi hevdu ve hatine girêdan û weke gulikekê li ser  
girika  
piyê zarok hatiye fîrketkirin, lê tiştê ko Koko dixwaze di nav wan  
hemû  
tiştan de mamostê xwe lê serwext bike, ew perçê hestiyê sêgoşe  
ye.  
Serwextiya mamoste Kevanot çêdibe, têdigêhîje ko ev hestiyê piçûk  
î  
sêgoşe hestiyekî kûsî ye û bêrika ko tê gotinê jî ev e, tiliya xwe pê  
dike û  
pirseke din ji Koko dike:  
— Baş e, çima vê bêrikê bi zarokan ve dikin?  
Koko bi pişirîn li Bengîne xwediyê gulikê dinêre û dibê:  
— Ji bo ko meriv çavînokî nebin.  
Li hemberî van tiştên seyr û van gotinên Koko î xwendekarê xwe  
mat-  
mayîneke rastkîno li mamoste Kevanot diyar dibe, lê ji aliyekî ve jî  
mîna



ko ew ê hîn gelek tiştên çê û xirab hîn bibe, mereqdarî lê zêdetir dibe,

tiliya xwe dide ser gulika wan tiştan, wî hestiyê piçûk î sêgoşe pêşan dide

û dibê:

— Baş e... ev bêrika ji bo çavînokiyê ye, lê ev darê duneçel çi ye?

Koko dîsa li Bengîn dinêre, bi pişirîn milê xwe hildikute û dibêje:

26

— Dara tawiyê ye... nizanim... diya wî pir jê hez dike, loma.

Mamoste Kevanot çîroka nivîştan dizane, dizane ko gelek kesên oldar

baweriya xwe bi nivîştan tînin, hemêliyan bi pî û hustuyê xwe de dikin,

ji bo şoretê zêr, pelik û moriyan jî bi wan ve dikin, lê darikên bi neçel û

hestiyên kûsiyan ji bo wî tişteki nû ye, tişteki seyr e, ji bo hestiyên wan î

piçûk kuştina kûsiyan ne tişteki ber bi aqilan e, pêşiyê naxwaze bawer

bike ko Koko van tiştan rast dibêje, lê dema ko ew bi çavên xwe jî wî

perçê hestî bi girika piyê Bengîn ve dibîne, serê wî zelal dibe, serwext dibe

ko ew tiştê ha bi destê mezinên malê jî dibe, di dilê xwe de: »Baştir e ko ez

vê pirsgirêkê bi dê û bavên zarokan re bipeyivim.« dibêje, Koko î xwen-

dekarê xwe dide rûnişkandinê, dîsa dixwaze vegere ser zarokan û li  
ciyê

mayî bidomîne:

— Lê dîsa jî... divê hûn bizani bin ko her heywanek, nola merivan  
giyanekî xwe heye. Dema ko kevirek an jî darek li serê wan, li boça  
wan

dikeve, ew dêşin. Herçiqas em pirî caran vê êş û azara wan hîs nakin  
û em

giriye wan nabihîsin, lê ew digirîn. Digirîn û hewar jî dikin... ditirsin,  
li

sitarkê digerin û alîkariyê dixwazin. Êş û azar... ka bila yek rabe ji  
me re

çêlî êş û azareke xwe bike. Ma kesek ji we ne ketiye carekê... piyê  
wî ne

êşiyaye?...

Dîsa dengê Koko bilind dibe, bi dengê xwe re dîsa ji ciyê xwe radibe  
û

bi mamostê xwe dide zanîn ko nemaze di lîstika berberano de serê  
merivan pir dêşe û gelek caran ew bi xwe jî rastî êşên weha kambax  
hatiye,

li ser pirseke mamostê xwe Koko jê re kat dike ku: di wê lîstikê de  
du

zarok dibin beranê du kesan, xwediyên wan beranan bi hustuyê  
beranên

xwe digirin, bi pesin û qêrîn wan li hev sor dikin û dû re jî berdidine  
hev,

zarokên ko di vê lîstikê de bûne beran ji dest xwediyên xwe têne  
berdan

û bi seriyên li hev dikevin, dema serê herdu beranan jî li hev dikevin  
wê

çaxê êşeke kambax xwe li serê wan beranan dide der û laşê wan  
ditevize.

Li ser vê yekê çav li serê mamoste Kevanot tarî dibin, pir namîne ko  
di

ser Koko î xwendekarê xwe de biqîre û bi hêrs tiştêkî bibêje, lê tavilê  
li

xwe divarqile û dîsa bi awakî nerm pirsekê dike:

— Baş e, di van lîstikên weha de xwediyên wan beranan kî ne?... kî  
dib-

in xwediyên beranan?

Bi tevgereke bêguneh Koko destên xwe di kêleka xwe de vedigire  
û:

— Nizanim, dibêje, kî bixwaze dikane bibe... serqisê, yê min pirî  
caran

bavê min e.

27

Heta hefteyekî jî mamoste Kevanot li ser vê rewşa zarokan dikeve  
ra-

manan, li rê û metodên gotinan digere, gotinên ko bikani be  
şênîyên vî

gundê ha serwextî perwerdekirina zarokan bike, dide ber hev dide  
ser hev

û di dawîya dawîn de biryara xwe dide ku: biçê bi pîvana van  
gundiyan

pêşiyê bi wan re têkeve galegalên mijarên sivik, li ser karûbarên rojane  
bipeyive, çêlî nexş û nexweşiyên jiyana gundîtiyê bike û hêdî hêdî berê  
mijara axaftinê vegerîne ser perwerdekirina zarokan û wusa jî dike.  
Di van rojên xwe yê pêşîn de mamoste Kevanot êvarekê piştî şivê berê  
xwe dide oda gund, di devê deriyê hewşa oda gund de xweşdengekî bilûrê  
ji hêla odê olan dide, ji bo hênikayiya payîza pêşîn deriyê oda gund heta  
dawiyê vekirî ye, mîna ko ji ber dengê bilûrê debar neke, tev dûmana  
titûnê ronahiyeke nîvmirî ji hêla hundur dirêjî derve dibe, di devê deriyê  
odê de dûmaneke tîr û tûj li ruyê wî dikeve, nola ko gava xwe bavêje hun-  
durê xwelîdaneke mezin û sergirtî, bêhna titûna şewitî û cixarên vemirî li  
pozê wî datê, di van heft rojên xwe de ev cara pêşîn e ko mamoste Kevanot tê vê odê.  
Li ber derî li quncikê hêla çepê li ber sekûka çaydan û piyalan xortekî jihevketî sekiniye, gelek seriyên gundî li ber dîwarên hêla hundur li ser  
kulavên nexşandî weke libên tizbiyê li ber hev in, li dawiya rêza hêla rastê  
û nêzîkî ciyê solan merivekî jar î navsere xwe di ser bilûreke darîn de

tewandiye, ba û kesera hundurê xwe valayî wê dike, mîna ko  
pêwîstiya wî  
ji hêwayên Xwedê, ji hêwayên der tune be, dev û lêvên xwe ji devê  
bilûrê  
dûrnaxe, bêhna xwe nagire, bi gotina guhdaran bêhna xwe dixwe,  
li ser  
sekûka hêla jorîn li ser kulavekî mor î nexşîn tev wî gopalê xwe î  
pîrozw-  
er Sêvdînê Selîm bi ber çavên mamoste Kevanot dikeve.  
Bi silava mamoste Kevanot re dengê bilûrê tê birîn, hemû gundî ji  
ber  
dîwarê hêla hundur radibin ser lingan û ji bo ko destê wî bişidînin  
dikevine rêzê, mamoste Kevanot ji hêla çepê dest pê dike, di nava  
van  
dest û ruyan de hinekên nû jî bi ber çavên wî dikevin, dema ko ji  
rêza piyê  
rastê ji jora odê de ber bi jêr heta ber ciyê solan tê, li wir dibîne ko  
destê  
bilûrvan dirêjî wî nabe, wê çaxê hay jê dibe ko bilûrvan ji herdu  
çavan  
kwîr e, li vir bi dilekî tenik ji xwe dişikê û li ber vê rewşa bilûrvan  
dikeve,  
28

zûzûka xwe berhev dike:

— Bi rastî jî tu bilûrvanekî hêja î, dibêje, destê wî digire û dişidîne.  
Piştî silav, peyvên xêr û xweşiyê mamoste Kevanot jî li gor berbora

gundîtiyê li ser sekûka hêla jorîn li ser kulavê mor î nexşîn li kêleka  
Selîmê  
Sêvdîn bi cî dibe, wî hay jê heye ko çend cot çavên mereqdar hertim  
li wî  
ne, bêdengiyeye kurt digire ser oda gund, ji bo kûvîtiya gundiyeke  
tiştên  
herî dijwar ev rewşên weha ne, peyvîna bi karmendekî re ji bo wan  
ji  
barek êzing girantir û ji zikêşekê diwartir e, gerçî dizanin û bihîstine  
ko  
mamosteyekî dilpak, dilovan, nefspiçûk e û bi zimanê wan jî  
dipeyive, lê  
bi kîjan zimanê dipeyive bila bipeyive, di çav gundiyan de zimanê  
kar-  
mendan, mijar û henekên wan cuda ne, pirsekê an jî daxwaza tişteke  
bikin dîsa dibe ko gundiyeke rabe û çê xirab bi kurtî bersiveke bide,  
an jî  
ko li derve li kuçe û bexçeyekî be dîsa dibe ko meriv çêlî tişteke bike,  
lê di  
hundurê odeyeye weha teng de weke mêvanekî xwe meriv ê bi kar-  
mendekî wekî mamoste re çî bipeyive!  
Xort û navseriyên gundî dipên ko hinek dest bi axaftinê bikin,  
Sêvdînê  
Selîm î salmezinê gund bi tevger û berbora gundiyan dizane, dizane  
ko di  
rewşên weha de destpêka axaftinê vatiniya wî ye, di van çend rojan  
de

pêwendiya herî baş jî wî bi mamoste Kevanot re daniye, loma li ser  
piyê

xwe vedigere ser wî û:

— Em çi bikin, xoce, dibêje. Em jî piştî karûbar û şîva êvarê tên û ji  
xwe

re guhdariya bilûra Şefo dikin.

— Dengê bilûrê xweş e... û ev ji kengê ve ye ko dengê bilûrê ne  
ketiye

guhê min.

Piştî van gotinan mîna ko Şefoyê kwîr ê bibîne, Sêvdînê Selîm destê  
xwe jî ber bi wî bilind dike û dibê:

— Rihme li bavê te, Şefo, de ka tu dîsa dest bavêje darê bilûrê û ji  
me

re bêhneke din jî tilî bike. Anuha mêvanekî Xwedê, mêvanekî me jî  
heye.

Şefoyê kwîr destê xwe li bilûra kêleka xwe dipelîne, bi giramgîriya  
merivekî dunyayeke tarî:

— Mêvanê me li ser ser û herdu çavên me, dibêje, xwe di ser bilûra  
xwe

de xwar dike, tiliyên wî li ser qulên bilûrê dipirpîte û devê bilûrê li  
ber

lêvên wî diricife, melodiya ko ji vî darê ha derdikve weke guvîna  
bayekî

dilore, dinale, dikûre û dûrûdirêj dibe, dengbêj, çîrokbêj an jî huner-  
mendên weha dema ko dibînin guhdarên wan hene, wê çaxê  
pêjneke

wusa li wan radibe ko çi ji destên wan were di wê gavê de ew ê raxin  
ber

çavên guhdaran.

29

Anuha Şefoyê kwîr guhdarên xwe nabîne, lê ew dizane ko li dora wî guhdar hene, gerçî Şefoyê kwîr dema bilûrê dirêjî lêvên xwe dike, tenê

heta du sê hilmên pêşîn guhdarên dorê di bîra wî de ne û carina dengê

saetxweşê dibihîse, lê jê û pê ve êdî ew bi tena serê xwe dimîne, di demên

weha de di taristana xwe de dikele, bi dil dişewite, giriyê xwe valayî bilûrê

dike û bêyî daxwaza xwe av bi çavên wî dikeve, anuha mamoste Kevanot

jî xwe wenda kiriye, tevayiyê bala xwe daye ser nalîna bilûrê û vê bergeha

Şefoyê kwîr, heta nuha jî wusa ji nêzîk ve guhdariya xweşdengêkî wusa ne

kiriye, rebeniya bextê Şefo û ev dengê ha çiqas jî li hev tê!

Ji dilê xwe heta gewriyê êşeke tenik digire ser mamoste Kevanot û li

hestiyê pozê wî dide der, bi baldarî, bi mereqdarî û bi dilekî şewitî guh-

dar dike, pêlên dengê bilûrê di bêdengiya odê de xwe li hev badidide, serê

hinek guhdaran di ber de û xemgîn xemgîn diponijin, hinek jî çavên xwe



ji pêlên dengê bilûrê nakutin, hêdî hêdî lêv li Şefoyê kwîr ditevize,  
tiliyên

wî diqurimin, melodiya hilma xwe ya dawîn giran û sivik dike, devê  
bilûrê ji lêvên xwe dûrdixe, dîsa datîne ber çoga xwe û mîna ko  
anuha ci-

vata dora xwe bibîne, berê xwe li hawurdora xwe dizivirîne û dibê:

— A dunya min jî ewqas e, gelî guhdaran!...

Sêvdînê Selîm bi rewşeke serbilind dibêje:

— Xwedê dunyayê li te ronî û feretir bike, Şefo!

Mamoste Kevanot bi heyranî, bi xemgînî dibêje:

— Hezar carî mala te ava, Xalê Şefo!

Û dû re pinepin bi civata dorê jî dikeve:

— Tiliyên te sax be!

— Destên te kesk be!

— Saeta te xweş!

Sêvdînê Selîm dengê li xortê jihevketî dike ko çayekê belav bike,  
dû

re vedigere ser mêvanê kêleka xwe û bi dengê nizim pê re dikeve  
gale-

galê:

— Şefo, merivekî reben e, xoce. Zaroktiya wî tê bîra min. Tê bîra  
min

di zaroktiyê de nexweşiyek lê çêbû, dê û bavê wî bêçare bûn, rêyeke  
ronî

ne dîtî û ew jî anuha... rebeno ji herdu çavan... Xwedê dilê wî fere  
bike,

Xwedê debarê bideyê! A ev xortê ha jî kurê wî ye.

Ew xortê ha berkêşoka çayê ber bi mamoste Kevanot û Sêvdînê  
Selîm  
tîne, her yekî piyalek çay datîne ber wan û dû re li civata dorê belav  
dike,  
di vê nabverê de du kes dikevîne hundur, ji wan du kesan yek Gelto  
î  
muxtarê gund e û mamoste Kevanot wî nas dike, lê yê din bi kinc û  
tev-  
30

girêdaneke bajarî ye, piştî ko solên xwe li ber derî ji lingên xwe dîkin,  
muxtar tê destê mamoste Kevanot dişidîne û çavên xwe li jêra odê  
li ciyê  
solan digêrîne ko biçê li wir rûne, li wir rûne û navberekê têxe  
navîna xwe  
û mamoste Kevanot ko bi wî re nekeve galegalên nêzîk, herçiqas  
xortên  
mayî xwe dikêşên ber hev û cî jê re çêdîkin, lê muxtar weke xwe  
dike û  
diçe li jêr li kêleka Şefo î bilûrvan rûdine.  
Lê ew î ko bi tevgirêdaneke bajarî ye, diçe destê mamoste Kevanot  
dile-  
qîne, xêrhatinê lê dike û dîsa bi tevgereke bajariyane xwe pê dide  
naskir-  
inê û dibê:  
— Ez, Gebran... Gebranê Baço me, xoce.  
Mamoste Kevanot bi awakî giramgîrane li kêleka xwe cî dide wî û  
dibê-

je:

— Li ser çavan! Fermo, kerem bike û rûne.

Gebranê Baço rûdine, çavên gundiyan zîq dimîne, tirs û şermeke bê-

mane li ser ruyê wan î kûvî diyar dibe, ditirsin û şerm dikin ko Gebranê

Baço tewşomewşo bipeyive û ew jî li hemberî mêvanê xwe î karmend şer-

mesar derkevin, lê piştî çend gotinên Gebranê Baço, dibînin ko mêvanê

wan î karmend çiqasî li hemberî wî giramgîr e, ew tirs ko li gundiyan

rabûye tavilê belav dibe, xwîna wan li Gebranê Baço dikele û hinek ji wan

li ber xwe jî dikevin, li ber xwe dikevin ko heta nuha wan rûmeteke we-

ha ne dane Gebranê Baço, anuha jî bi çavên xwe dibînin ko karmendekî

wekî mamoste Kevanot qedirê wî digire û tew li kêleka xwe jî cî dideyê.

Piştî ko dibînin mêvanê wan û Gebranê Baço ketine galegalê û bala wan li ser hev in, gundî êdî bê tirs û bê şerm di ciyê xwe de li wan dinêrin,

guhdariya wan dikin, dibînin ko Gebranê Baço bi awakî giramgîr û dengê bajariyane bi mêvanê wan î karmend dide zanîn ko ew jî ji vî

gundî ye, fakulta edebî xwendiyê, lê beriya ko biqedîne ji ber sedemên

bêyom ji dibistanê veqetiyaye û mêvanên wan jî li vî xwendekar î  
gundiyê

wan vedigerîne û dibêje:

— Ya rastî, ez gelekî kêfxweş bûm, birakê Gebran!

Kêfxweşiya mamoste Kevanot ji ruyê wî diyar dibe, diyar dibe ko ew  
dixwaze gelek tiştan jê bipirse, bi wî re têkeve galegalên dûrûdirêj,  
pê

bizani be û bide zanîn, di vê gavê de serbilindiyek li ruyên gelek  
gundiyan

jî diyar dibe, xwe diwerimînin ko yekî wekî Gebranê Baço ji gundê  
wan jî

derketiye, herçiqas ev merivê ko anuha mamoste Kevanot qedirê  
wî digire

û kêfxweşiya xwe pê dide zanîna, di çavên gundiyan de rûmeteke  
xwe ya

taybetî tune bû, lê dîsa jî di demên weha de dibin xwediyê rûmetên  
bilind.

31

Gebranê Baço berpirsiyariyek girtiye ser xwe ko mamoste Kevanot  
bi tenê û bê galegal nehêle, an jî di çavên gundiyan de wusa ye,  
mîna

berê êdî gundî jî di ber wî de şerm nakin, serwext dibin ko di gund  
de

yekî ji heq danûsitandinên wusa fermî derkeve, ew jî Gebranê Baço  
ye, weke ko hevalbendekî wî yê kevin be, Gebranê Baço vedigere  
ser

mamoste Kevanot û dibê:

— Hêvîdar im, we ji av û hewa gundê me hez kir, xoce?  
— Ko ez rastiya dilê xwe î van çend rojên kurt bibêjim, ez ji we, ji vî gundê we gelekî û gelekî xweş û kêfxweş im. Ez xwe bextiyar dibînim ko  
mamostetiya gundekî weha bûye para min...  
Bi bihîstina vê kêfxweşiya mamoste Kevanot re serê gundiyan bilintir  
dibe, çavên xwe ber bi wî vedikin, lêvên hinekan bi pişirîn di ser hev de  
dilerizin, Sêvdînê Selîm bi pirsekê beşdarî axaftinê dibe û dibê:  
— Navîna te û zarokan çawa ye, xoce?... nerihetiyên dîkin an ne?  
Ji bo mamoste Kevanot, pirsê herî girîng ev e û bersiva ko ew ê li vir bide jî bi ewqasî girîng e, ev bi qasî hefteyekî ye ko li ser pirs û bersiveke  
weha ketiye ramanan, xwestiye mijareke weha veke û bi gundiyan re  
bipeyive, lê heta ko xwe serastî vê mijarê dike, gotin di gewriya wî de gi-  
ran dibin û wextê digirin, nizane ko ew ê ji kuderê û çawa dest bi gotinên  
daxwaza dilê xwe bike, di dawîya dawîn de gotinên xwe berhev dike  
û  
weha dibê:  
— Na, nerihetiyên ko zarok dîkin, tune. Lê... di van çend rojên pêşîn  
de hinek tişt, hinek pirs... hinek girêk di serê min de çêbûne ko divê em

bi hev re vekin, veçinin, bibersivînin, nû bikin û divê em bi hev re  
ava  
bikin. Li ser bingehê ramanekê weha divê em bipejirînin ko êş û  
kêfxweşiya min, êş û kêfxweşiya we ye. Herweha êş û kêfxweşiya  
we jî ya  
min e. Ez kurt û vekirîtir bibêjim. Di van çend rojan de nerihetiya  
çend  
salan bi min girt. Hîn di van çend rojên min î pêşîn de mar bi  
dergûşekê  
veda û bi sitara Xwedê ji mirinê filitî. Çend roj berê jî min di  
dersxanê de  
hinek tiştên wusa seyr ji devên zarokan bihîstin ko dûrî aqilan e! Ez  
tê-  
nagêhîjim... hûn jî dizanin ko zarok neynikên civakê ne, ji civakê, ji  
dora  
xwe ew çî bibînin, bibîhisin û fêr bibin, ew bi wan mezin dibin. Îcar  
weke  
mezinên wan, divê em bi şîret biçîne ser wan û tiştên baş fêrî wan  
bikin.  
Divê em bi wan bidine zanîn ko meriv destê xwe di qulên dar û  
dîwaran  
re nakin, kûsiyan nakujin û bi şev di newalan de nêçira beqan  
nakin...  
Belê, ev çend roj in ko ez van tiştan dibînim û dibihîsim. Min xwest  
ko  
ez ji we mezinên zarokan jî bibîhisim ka hûn bi van aliyên zarokên  
xwe  
32

dizanin an ne, ka hûn çî difikirin û bi hev re em dikanin ji bo wan çî bikin.

Bi van gotinên xwe yê dawîn re bi awakî wusa li gundiyan dinêre û

dipê ko ew ê li ser zarok û van tevgerên wan gelek dîtînin cuda cuda bi

lêv bibin, di hişê xwe de li bersiv û metodên herî baş digere ko vê pirsê bi

hev re û bi riyên baqilane çareser bikin, lê tavilê diyar dibe ko gundî bi

xwe têngêhîjin, têngêhîjin ko karmendekî nola mamoste çawa serê xwe

di ber kuştina beq û kûsiyan de dêşîne, ji vê rewşê nerihet dibe û tew

hatiye li ser vê yekê bi wan re dipeyive jî.

Heta nuha jî kîjan karmend hatiye vî gundî ferman daye, xwestiye, gir-

tiye û ewqas!... lê ev mamostê ha çêlî tiştêkî din dike, hatiye çêlî rewşa

zarokan, çêlî kuştina beq û kûsiyan dike, qulên dar û dîwaran bi lêv dike,

li vir hinek gundî ji karmendiya mamoste jî dikevîne gumanê, lê ji ber

rengdêra muxtariyê be jî, muxtarê gund radibe bi mamoste Kevanot dide

zanîn ko ew baştir dizane, ew çî çawa dixwaze bila wekî wî be, bi vê

danezana muxtêr re dîsa tiştêkî mîna jîrî û şerefmendiyê xwe li ruyê hinek

gundiyan dide der, pê serbilind dibin ko biqewume ew jî dikanin têkevîne galegalên fermî.

Mamoste Kevanot bi awakî nermtir û hîn vekirîtir bi gundiyan dide zanîn û dibê:

— Ev rewşên zarokan bi min tenê çareser nabin. Divê hûn jî xwe ser-

wextî vê yekê bikin û em bikani bin bi hev re çareser bikin... an ne... safî

nabe. Û ev tiştên ha di jiyana zarokekî de gelekî girîng in.

Gelek gundî li vir nû bi bavtiya xwe dihesin ko li ser mezinbûna zarokan fonksiyoneke wan jî heye, lê nizanin fonksiyoneke çawa, mîna

ko mamoste Kevanot yekî ji wan, yekî ji malê be, Sêvdînê Selîm li kêleka

xwe vedigere ser û dibê:

— De tu çi dibêjî bila wusa bikin, xoce, ma ew ê ji te çêtir bizani bin! Bi qasî sê saet û nîvan li ser vê rewşa zarokan, mamoste Kevanot pêşni-

yarên xwe dibêje, metodên pedagogan bi lêv dike û dixwaze bi gundiyan

re dîrûdirêj bipeyive, gundiyan ko vê axaftina wî tînegêhîjin, dengê xwe

nakin, yên ko hinekî tîgêhîştine ka mamoste Kevanot li pey çi ye, ew jî

hertim:



— Te çawa divê em wusa bikin, xoce... ma em ê ji te baştir bizani bin,  
dibêjin û ji vê hevokê zêdetir jî tişteki din bi lêv nakin.  
Mîna ko bi ehmeqekî bikene kenekî bêwext bi Gebranê Baço digire û  
di ber xwe de dibê:

33

— Gundiyên me tişteki nizanin... nizanin bê kûsî jî nayêne kuştin.  
Tev Sêvdînê Selîm û mamoste Kevanot hinek kesên din jî bi van gotinên Gebranê Baço dikenin, lê mîna ko di berê de naxoşiyek di navîna wî  
û Gebranê Baço de hebe, feqî Dimso hinekî bi hêrs destê xwe ber bi wî  
dirêj dike û dibê:

— Tu bi zimanekî wusa sergirtî dipeyvî ko ji te wetrê kes têngêhêje, Gebran. Xwedê jî dizane û herkes jî têderdixe ko tu tinazê xwe bi me, bi van gundiyan dikî. Ma ne rast e ko em bibêjin, em nizanin?... Lê em tişteki dizanin, Gebran. Em dizanin ko herkesî û te bi xwe jî di zaroktiya xwe de kûsî kuştine, te beq girtine û te çavên wan jî derxistine. Zarok in...

Ko kûsiyan jî nekujin, çi bikin... ma hevdu bikujin?

— Ma pêwîst e ko zarok tişteki bikujin?

— Na, Gebran, na... ez nabêjim ko pêwîst e. Lê di vî gundî de zaroktiya herkesî wusa bûye û bi vî awayî derbas bûye... em çi bikin! Ma em ra-

bin çoyê xwe bigirin û derkevin pêşiya zarokan!...

— Ev tiştê bi çu safî nabe.

— Tiştê çu safî nabe, Gebran? Ma em ê çawa ji zarokan re bibêjin, wusa

nekin!... zarok in... ew ê kûsiyan bikujin, ew ê li pey majîrokan jî bibezin

û gumgumokan jî bikujin... bila wekîdin tiştên xirab nekin, bila bikujin!...

— Ma tiştên wekîdin xirab çu ne?

— Çu ne?... biçu û sînoka oda me ya mezin bibîne bê çikirine. Ji bo ko

çêlên çûçikan bigirin hemû ji hev xistine, zarokên nerind!... jê yek jî Aramê me bû. Bi Xwedê lêxistina ko min li wê kir, meriv li kerekî jî nake...

— Ev tiştê bi lêxistinê jî safî nabe.

— Baş e, lê ew ê bi çu safî bibe? De ka tu zanayê me... û tu bibêje, Gebran, em çibikin?

— Ez ne zanayê kesekî me. Hûn bi xwe bifikirin ka bê hûn ê bikani bin

çu bikin.

Sêvdînê Selîm bi awakî bêhêvî destê xwe ber bi mamoste Kevanot vedi-

gire û dibê:

— Xwedê wan bihêle! Zarokên anuha nerind û serhişk in. Dîsa bi xêra

Xwedê, bi xêra xoce parîkî baş bibin.

Ev kurtepeyvîna li ser zarokan tirsekê li mamoste Kevanot çêdike,

tirsekê lê çêdike ko gundî hay ji van tevgerên zarokên xwe hene lê dîsa jî

ji bo wan ne xem e, ji gotinên gundiyan têderdixe ko ev problema ha ê li

34

ser milê wî tenê bimîne, cara duduyan bi gundiyan dide zanîn ko ev pir-

sa ha bi wî tenê çareser nabe, divê dê û bav jî ji zarokên xwe re bibêjin, bi

wan re bipeyivin û bi vî awayî bibin alîkarên wî, li ser vê yekê dîsa vedi-

gere ser rê û metodên pedagogan û ji gundiyan re vedike, gundî guhdar

dikin, lê nizanin an jî naxwazin ko ew jî tiştêkî bibêjin.

Li ser vê yekê carina, tenê carina Gebranê Baço dîtinên xwe vedike û

nemaze bi mamoste Kevanot dide zanîn ko pedagojiyên baş di civakên

weke civakên wan de ciyê xwe nagirin, metodên pedagojiyên weha li gor

rewşa civakê ava dibin: Rewşa civaka me û nemaze rewşa gundê me ji bo

metodên weha dest nade. Bo nimûne, ko babetê perwerdekirina civakê

neyête guhertin, ev tiştê jî nabe, dibêje.

Axaftina vê mijarê ji nav gundiyan odê derdikeve û tenê di navîna

mamoste Kevanot û Gebranê Baço de geş dibe, gundiye li ode guhdar  
dikin û Xwedê dizane cara pêşîn e ko gelek peyvikên weha ji nêzîk  
ve  
dibihîsin, felsefe, pedagog, psîkolojî...  
Ava şevê cara çaran germ dibe, dibe çay, li civata ode belav dibe û  
tê  
vexwarin, şevbuhurka oda gund pîr dibe û wexta belavbûnê tê, lê  
hîn di  
vê şevbuhurka îşevîn de mamoste Kevanot têdigêhîje ko di vî gundî  
de  
yekî ko bikani be bi axaftinên zanyarî bide û bistîne, ew jî Gebranê  
Baço  
ye, piştî ko perê çayan jî tê dayînê, beriya ko şênîyên oda gund  
şevxweşiyê  
li hev bikin û belav bibin, li hewşa oda gund mamoste Kevanot bi  
daxwaz  
bi kêfxweşî bi Gebranê Baço dide zanînê ko hevdu bibînin.

35

Ro li ber ava ye, xwendekarên dibistanê li malan belav bûne,  
mamoste  
Kevanot û Gebranê Baço hevdu dîtine, li ber dîwarê lojmana  
dibistanê,  
li ser du kursiyan xwe dane ber tava paşnîvroyê û dîsa ketine  
galegalekê,  
pencerên dersxanê vekirî ne, zarokek xerîkî avreşîniya hundur e û  
yekî

din jî bi sinikê hundur baqij dike, gelek nabuhure ev herdu zarok tev çen-

tên xwe ji hundurê dersxanê derdikevin, tên, bi mamostê xwe didine

zanîn ko wan dersxane paqij kirine, mamostê wan destê xwe li porên wan

dipelîne û dibê:

— We baş kiriye, bijîn!... de anuha jî biçin û li malê xerîkî dersên xwe

bibin.

Herdu zarok ji wan dûrdikevin û serjêrî malên xwe dibin, mamoste Kevanot li pey wan dinêre, dilê xwe bi wan dêşîne, vedigere ser Gebranê

Baço û dibê:

— Ew ê gelekî baş bûya ko du gundiyan xwe bida ber vî karê paqijkiri-

na dersxanê. Li gor paqijiya mehekê an jî salekê meriv ê pereyek bida wan

û hew!... Ev zarokên reben bi çi dijawariyan dersxanê paqij dikin! Ew ê hîn

biçin û li malê dersên xwe jî çêkin!

Gebranê Baço çentê li ser çoga xwe di ber xwe de li erdê dispêre lingê

sandaliya xwe û bi keservedan dibêje:

— Gundiyên me xwe nadin ber.

— Xwe nadin ber çi?

— Xwe nadin ber vê reformê.

Mamoste Kevanot bi ken li ruyê Gebranê Baço dinêre û dibê:

— Ma ev jî reform e, birayê Gebran?

— Ji bo gundiyan me reform e... û reformeke ji dunyayê jî der e, xoce.

— Çawa ji dunyayê der e, birayê Gebran? Ev yeka ê ji bo zarokan jî baş û rihet be. Bi kêmanî piştî dibistanê ew ê biçin û xerîkê dersên xwe bibin.

— Armanc û babetê gotinê çî dibe bila bibe... tiştêkî ko heta nuha li vî

gundê ha bi kar ne hati be, cî nagire û nayê pejirandin jî...

— Ez têngêhîjim bê çima pêşniyarên baş ê cî negirin? ko meriv ji wan

re bibêjin û wan serwextî başiya van tiştan bikin, çima nepejirînin, birayê

Gebran?... ma ez tiştêkî çewt dibêjim?

36

— Ez nabêjim ko tu tiştêkî çewt dibêjî, xoce. Tu rast dibêjî û îdeal di-

fikirî. Lê tu tiştêkî mayî nizanî. Tu bi xwî û tevgerên gundiyan me nizanî.

Wan ne hay ji xwendina zarokan, ne jî ji rewş û rihetiya zarokan heye.

Mîna ko bibêje ez jî bi te re mamoste Kevanot bi destê xwe çoga Gebranê Baço ditepîne û dibê:

— Baş e, baş e... lê ez jî dibêim ko divê meriv riyekê bibîne, ji wan re bibêje û wan haydarê vê yekê bike.

— Tu çî dibêjî bibêje, xoce, lê ew ê dîsa jî nekeve serê wan.

— Ez bawer im tu pir hişk diçî ser gundiyan loma, birayê Gebran.  
Min

dît... ez bi çavên xwe jî dibînim ko tu tew pîvana gundiyan nadî ber  
ça-

van. Tu li gor zanebûna xwe bi wan re dipeyivî...

— Baş e, ma ez ê li gor zanebûna kê bi wan re bipeyivim?

— Li gor zanebûna wan, bi zimanê wan bipeyive.

— Ma ez bi erebî dipeyivim?... binêre, xoce, gundiye min in û ez bi  
wan dizanim. Bawer bike, ez pir baş dizanim ko ji bo gelek tîpên  
gundiyan me, aqil, çav û ew zimanê ko Xwedê daye wan  
fonksiyoneke

xwe tune... de îcar te bawer kir!

— Li ser vê yekê ez bi te re, birayê Gebran, lê divê meriv ji bîr neke  
ko

ev merivên ha gundî ne û ji bo ko meriv wan serwextî tiştê bikin  
divê

meriv dakeve pîvana wan.

Li vir dilê Gebranê Baço dikele, destê xwe li ba dike, li ser sandaliyê  
cî

li xwe xweş dike, li nava çavên mamoste Kevanot dinêre û dibê:

— Ko tu dakevî pîvana wan, bawer bike tu ê li wir bimînî... bi  
gotineke

din, tu ê di pîvana wan de bihetikî, xoce.... tu ê di pîvana wan de  
bifetisî

û biçî. Di pîvan û dunyayên wan de ev kuçên gund ê li te teng û zirav  
bib-

in, serê te ê bêşe, dilê te ê li hev bikeve û tu ê verişî. Tu ê di xwe de  
verişî,

di wan de verişî... tu ê bibînî ko di kuçan de, di hewşan de, di penceran

de çawa serê xwe dirêj kirine, weke cin û pîrebokan li vê rewşa te dinêrin.

Bi kurtebirî, ev kuçên vî gundê ha ê li te bibin labîrenteke cinan û tu ê ji

nav dernekevî... ew pirsgirêkên di serê te de... ew ê bibine girêkên şeytên

û tu ê nikani bî vebikî... a wê çaxê... wê çaxê ew ê tinazên xwe jî bi te bikin

û bikenin... Ew ê te dîn bikin û weke min berdin çolan. De ka tu rojekê

biçe û pirs min ji wan bike... na, ne tenê ji wan jî, dûr neçe... biçe û ji

bavê min bipirse. Lê ez weke navê xwe dizanim ko ew ê ji te re bibêjin:

Serê Gebran çelq bûye. Belê bi wî aqilên xwe navekî wusa jî bi pey meriv

dixin... De îcar weke zana û xwendayekî tu ê çawa dakevî pîvaneke weha,

xoce?

37

Mamoste Kevanot têdigêhîje ko gundî û Gebranê Baço li hev nakin, têdigêhîje ko gundiyan navê şelqbûnê jî bi pey xistine, lê ji wî napirse û

nabêje çima, li vir dilê wî bi Gebranê Baço dişewite û bi awakî hîn nermtir dibê:



— Ez têdigêhîjim, birayê Gebran. Zanebûna yekî xwenda û gundiyekî ne wek hev e. Analîz û têngêhîştina wan jî ji hev dûr e. Toleransa kwîr- famiyê tune ye û em bibêjin ko rastiya van gundiyên ha tiştêkî weha ye. Wek ko min got, ez bi te re... îcar vatiniya ko bi kesên xwenda dikeve çî ye? Tiştê ko ez dizanim: Yekî serhişk rabe û vê serhişkiya xwe çiqasî jî zêde bike, divê meriv lê negirin. Lê ji bo yekî baqil ne wusa ye. Ji bo baqilekî, şermeke mezin e ko kêmaqiliya yekî hemberî xwe têngêhîje. Ev ne tenê bêşansiyeke kesên baqil e, herweha vatiniyeke wan e jî. Gebranê Baço di ber xwe de difikire, bi dilekî şikestî û bi rewşeke bêhêvî:

— Tu dikî û dixwazî ji min re bibêjî ko dînitî tiştêkî baqilane ye.  
— Tu çawa têdigêhîjî bila wusa be, birayê Gebran. Lê min xwest bibêjim ko yekî xwenda û baqil divê bi her seriyekî re derbas bike. Serhişk hene, serserî hene, saxik hene, ehmeq hene, dîn hene... belê, hene lê... lê hunermendî jî ew e ko meriv bikani be bi wan re bide û bistîne. A ev jî bi zanebûna baqilî dibe, bi zarxweşiya toleransê dibe, bi peyivînê dibe. — Ez bi wan re peyivîme, xoce. Bi wan re ez bi zarekî herî xweş jî

peyvîme... min ji mele û seydayekî bêtir ji wan re gotiye... min ewqas ji wan re gotiye ko êdî mû bi zimanê min ve hatiye... lê bawer bike gotin jî ji bo tîpên weha pere nake!... çawa bibêjim... binêre weke nimûne ez ji te re bûyereke piçûk bi lêv bikim, xoce... Bi navê Pêlo pismamekî min î li dor salên 11an hebû. Di şevên şil û tarî de apê min ew dişand ber kar û berxan, nîvê şevan ew radikir dişand şevînên gayên cot. Di wan deman de pirî caran min ji apê xwe re digot: »— Vî zarokî bi tenê neşîne şevînên gayên cot.« Lê apê min li min vedi-gerand û digot: »— Na, bila biçe. Bila biçe û bibe mêrê şevên tarî. Bi vî awayî ew ê tarî û ronahiyê baştir ji hev derxîne.« Ez li ber digeriyam û min digotê: »— Zarokekî piçûk e, tirs ê lê çêbibe.« Lê wî bi ya xwe dikir. Di dawîya dawîn de jî weke min derket. Li gor gotina amoja min, di şeveke buhara navîn de ji bo cot dîsa bi tena serê xwe li ber gayê şevînê bûye. Dema amoja min taştiya apê min biriye ser cot, nêhiriye ko ev pismamê min î

piçûk serê wî di ber de û her bi raman bûye. Amoja min jê pirsîye  
ka ew

38

nexweş e, an ne. Lê pismamê min bi çavekî bêhêvî zîq li ruyê diya  
xwe

nêhirîye û dengê xwe ne kiriye. Ji wê rojê û pêve jî her weke xwe  
maye.

Lal bûye û peyv ji devê wî derneketiye. Dema ko ez bi vê yekê  
hesiyam,

ez gelekî li ber ketim. Weke birayekî min î piçûk be, min jê hez dikir.  
Porê wî reş û fîlikî, çavên wî şîn... gelekî şêrîn bû. Di vê zaroktiya wî  
de jî

diyar bû ko ew ê xortekî xweş û lihevhatî jê derketa. Ji bo ko ziman  
lê vebe

û dîsa bibe Pêloyê berê çî ji destê min dihat min dikir. Ez diçûm li  
ber dis-

ekinîm, pê re dilîstim, dipeyivîm... Min ji apê xwe re digot, min pê  
dida

zanîn ko em wî bibin ser doktoran, bila lê binêrin. Lê ne diket serê  
apê

min. Xwest ko li ser şêx û meleyan bigerîne. Rebena amoja min  
destên wê

li ser sîngê wê girêdayî, bi rewşeke hustuxwar li ber vî lawê xwe î lal  
dis-

ekinî û hêsir dibarandin. Dû re jî apê min bi gotina xwe kir û gund bi  
gund ev pismamê min gerand:

»— Şêxê Sirûcê xurt e.« digot. Heta ko rojek hat û pismamê min î

piçûk bû nexweşê nava nivînan. Ne nan û ne jî av bi gewriyê de diçû.  
Amoja min paçek di avê de fikir, dihanî di lêvên wî yên hişk re dida.  
Herweha ev piçûka ji nava wan nivînan ranebû û bi ruhekî bêguneh  
çû

hafa Xwedê...

Bi vê peyvika Xwedê re bêdengiyek digire ser galegalê, çavên  
Gebranê

Baço tije av dibe, bi awayekî bêçare destên xwe di bêrika xwe de  
dike, heta

ko titûna xwe derdixe û jê cixarekê jî dipêçe herdu serî bêdeng in,  
ji katki-

rina vê bûyerê rihetiyeke sivik li Gebranê Baço diyar dibe, bi  
keservedan

titûna xwe dirêjî mamoste Kevanot dike û dibê:

— Kerem bike, xoce, em çi bikin... De icar tu hatiye çêlî zarokan dikî.  
Ka zarokên reben ê di rewşên weha de çi bikin?

Diltenikiyekê girtiye ser mamoste Kevanot jî, ji hêlekê ve titûnê  
dipêçe

û ji hêlekê ve jî mîna ko li çareseriyê van pirsgirêkan bigere,  
diponije, di-

rame û dû re bi dengekî nizim dibê:

— Xuyeye lawik gelekî tirsyaye. Xwezika we pêre bigîhanda û bibira  
ser

doktorekî.

Gebranê Baço du hilmên dirêj li cixara xwe dixê, hinekî jî bi hêrs  
destê

xwe ber bi hêla gund radike û dibê:

— Lê heta ko ehmeqên weha li vî gundî hebin, kesek pêre nagêhîne...

kesek pêre nagêhîne ko tişteki baş bike.

Mamoste Kevanot agir bi cixara xwe dixê, mîna ko hîn jî di bandora bûyera jorîn de be di ber xwe de dibê:

— Tirs e, tirs... tirs li lawik çêbûye.

39

— Kî be jî ew ê bitirse, xoce. Şevê nivê şevan rûdinin, bêyî ko zarokan

ji xwe dûrbixin, dest pê dikin... çêlî cadûkaran, çêlî çavînokiyên çavên

xirab, çêlî pîrebokan, çêlî cin û periyan dikin...

- Rast e, di jiyane de bi taybetî jî di jiyana gundîtiyê de meriv rastî gelek

tiştên seyr tîn. Îcar divê meriv hêdî hêdî, bi gotin, bi peyv û pratîkê yek

bi yek wan ji van tevger û berborên naxoş dûrxin.

Gebanê Baço hilma dawîn li cixara xwe dixê, dûmaneke tîr û hêşîn ji

devê xwe berdide, nola ko tew nekeve serê wî, destê xwe jî li ba dike û bê-

deng dimîne, ev rewşa wî ji ber çavên mamoste Kevanot nafilite, dibîne

ko ciyê van gotin û dîtinên wî di serê Gebanê Baço de tune, loma dixwaze hefsarê mijarê ber bi hêleke din bizivîrîne û dibê:

— Te çêlî fakulteyê edebîyatê dikir, birayê Geban. Te çi kir... ma te

ne qedand?

— Na min dev jê ber da, xoce.

— Çima?...

Gebranê Baço vê carê herdu destên xwe ber bi gund radike û bi pişirîneke tinazane dibê:

— Ji ber ehmeqiyên şêniyên vî gundê ha!

Mamoste Kevanot jî bi pişirîn li wî dinêre û bi dudilî, bi pirs gotina wî

dubare dike:

— Ji ber ehmeqiyên gundiyan?...

— Erê. Lê nebêje çima û çawa?

Dilê mamoste Kevanot bi Gebranê Baço dişewite û xwe bi xwe: »Diyar

e ko ev rebenê ha serê xwe pir di ber van gundiyan de dêşîne.« dibêje û li

ser gotina Gebranê Baço ew jî nabêje çima, nabêje çawa, lê bi çavekî tije

pirs, bi mêzekirineke mereqdar di ciyê xwe de bédeng dimîne.

Gebranê Baço têdigêhîje, pirsên di ser û dilê mamoste Kevanot de dibîne, bi dijwarî pişirînekê dikişîne ser lêvên xwe, mîna ko çîrokeke nîvçe bidomîne dest pê dike û dibê:

— Di gund de rewşa me ya aborî ji ya xelkê ne çêtir be, xirabtir jî nine,

xoce. Ji xwe gêda mala me ne giran e. Ez nûxuriyê diya xwe me û ji bilî

min jî zarokên dê û bavê min tune. Li gor gotina diya min, di pey min re

zarokek ji ber çûye û di ser wê rojê re êdî bi zarok nexweş ne ketiye.

Heta

vê buhara çûyî... destpêka buhara navîn em bibêjin, min li unîversîta ba-

jarê E'ê di beşa fakulta edebiyatê de sala xwe ya duduyan dixwend.

Di ce-

jnerojên demên xwendinê de carina dihatim vir, min li dê û bavê xwe

dipirsî, wan jî bi kêfxweşî, bi serbilindî rewşa min û dersan pirs dikirin. A

40

di cejnorojê weha de ez dîsa hatim gund. Ez hatim lê rewşa ko li malê

bi ber çavên min ket, ne weke hertim bû. Ne ken, ne pişirîn û ne jî kêfxweşiya hercarîn. Gwîné diya min zer, mirûzê wê tirşûtal û bi rewşeke

bêhêvî bû. Li ber argûn rûnişti bû. Çer ko çav li min ket, kelagiriyekî bêy-

om gewriya wê xetimand û lêvên wî lerizîn. Ez çûm min diya xwe hemêz

kir û li rewşa wê pirsî, min bavê xwe jê pirsî. Bavê min ne li mal bû.

Pêşiyê

ez hinekî tirsiam jî. Tirsiam ko tişteke bi serê bavê min de hati be.

Lê

diya min bi keservedan sedemê vê rewşa nû an jî xemgîn dûrûdirêj ji min

re kat kir û dû re jî got:

»— A wusa... piştî vî salê xwe kokimê bavê te jî dixwaze bizewuce!«

Li

hemberî van gotinên diya xwe devê min ji hev ma. Ne min dixwest

ez bi

van gotinên wê bawer bikim, ne jî min bawer dikir ko diya min

henekan

li hev tîne. Heta nuha jî tiştêkî weha ji devê bavê min derneketi bû

an jî

min ne bihîsti bû. Tenê di demên bêhtengiya xwe de carina bi diya

min

re pevdiçinî, di ser de dikire pilepil û digotê:

»— Manga behavêtî! Bizina histewir!« Lê ji bilî demên weha bêhteng, hertim aqilmendî dikir û digot:

»— Zarokên zêde, serêşên zêde ne... Ko em bikani bin xwedîtiyê lê bikin û tiştêk jê derkeve, ev yeka têra me dike.« Ez bawer im ji ber vê yekê

bû ko wî hişt ez biçime unîversîtê. Lê piştî van gazin û gotinên diya min,

tirsek li min rabû. Ji diya xwe re ne, lê di dilê xwe de min digot: »Ku bavê

min ling ne kiri be salên xerifînî, wê çaxê ber bi dînbûnê diçe.« Gelek ne

buhurî bavê min hat malê. Ez rabûm, weke hertim çûm destê wî û min

lê pirsî. Lê min tavilê têderxist ko gotin û gazinên diya min rast in.

Mîna

ko dilê wî li mala wî, li min û diya min sar bibe, weke berê bi daxwazeke



germ pirsâ min û xwendinê ne kir, li ser pêşeroja mala me bi min ne şêwirî. Tenê xêrhatineke sar û bêxwê ji devê wî derket, piştâ xwe bi me de

kir û derbasî oda malê bû. Di wê navberê de tiştêkî din jî bala min kişand.

Simbêl û ew çend tayên porê ko bi paş û kêleka serê wî ve ma bûn, reş kiri

bûn. Ev cara pêşîn bû ko min didît bavê min boyaxa porê reş bi kar di-

hanî. Bi qasî kişandina cixarekê di odê de ma û dû re dîsa hat eywanê ba

me. Ez bawer im ew jî têngêhîşt ko diya min hertişt ji min re gotiye û ev

yeka êdî ne tiştêkî veşartinê ye. Mîna ko ne ji malê be, bi tevgera yekî dûrî

malê got:

»— De qeyê nuha diya te ji te re çîroka me gotiye, Gebran. Xuyaye ez

û diya te li hev nakin êdî.« Diya min ya reben û saxik bi rewşeke bêguneh

hestîva êrgûn di dest de agir tevdida. Ev gotinên bavê min rasterast nehe-

41

qiyek bû û li diya min dikir. Lê dîsa jî min xwest ko ez têbigêhîjim ka bavê

min çî difikire û çî dixwaze:

»— Tiştê ko tu û diya min li ser li hev nakin çî ye, bavo?«

»— Nizanim...« got. »çima ez di roja rojîn de bi ya xwe nekim û çima ez anuha guhdariya zimandirêjiya diya te bikim...« Ne tenê bi tevgereke

şêwirmendane, herweha min hustuyê xwe jî hinekî li ber tewand û min

bi rewşeke bergerîn gotê:

»— Ma ev zimandirêjî ye, bavo? Diya min rast dibêje, zewaceke nû ji

bo te ne tişteki maqûl e.« Lê bavê min serî li xwe gerand, pêşiyê kir ko

bibêje ji bo min xweng û bira pêwîst in, ji bo mala me mêr û paşmêr di-

vê, lê dû re rasterast hajote ser diya min û gotê:

»— Ji ruyê vê diya te de ez di nava xelkê de rezîl bûme. Maleke bê zarok,

bê paşmêr... bîreke zuwa ye.« Diya min bi şermesariya bîreke zuwa, bi

ruyekî xemgîn berê xwe bi bavê min de kir û gotê:

»— Wê çaxê Gebran bizewucîne! Salên wî bûne bîst û pênc.« Mîna ko

bibêje, ca tu raweste hîn ez ê çî bikim, bavê min destê xwe jî ber bi hewşê

li ba kir û got:

»— Ez ê wî jî bizewucînim, ez ê wusa bikim ko bila naxirek zarok li vê

hewşa ha bilîzin. Lê bila pêşiyê xwendina xwe biqedîne.« Kelagirî li gewriya diya min piçikî, bi rewşeke reben û bêkes di ber xwe de got:

»— Ez hêwiyeke wusa naxwazim!... Hêwîyeke ji mala Dimso...

Qelendê xwe jî bêjîngêk zêr xwestine. Dixwazin bibin xwedîparên  
erd û  
rezên me!« Li vir ez têgêhîştîm ko keçîk, bi gotineke din dêmariya  
min ji  
kîjan malê ye, kî ye, çend salî ye... û ez tiştêkî din jî têgêhîştîm ko  
tew  
hatiye xwestin jî. Di wê gavê de ew bavê min, li ber çavê min bû  
weke ke-  
virekî reş. Di çav min de ji rûmeta xwe ya hertimê ket. Piştî ko min  
pê da  
zanîn ko ev tevgera wî tiştêkî dûrî aqilan e, wê çaxê mîna ko li rê û  
metodên parastina vê daxwaza xwe bigere, serê xwe xiste ber xwe  
û got:  
»— Ê... ez çi bikim?... ma çi dibe ko... çima zewaceke din jî nebe  
para  
min?« Bûyer ji bo min zelal bû êdî. Bêyî ko zêde li ser rawestim û  
têkevim  
ramanan, min gotê:  
»— Tu çi dikî, çi difikirî, wusa bike... lê ji bîr neke ko keça mala  
Dimso  
sêzdeh salan ji min piçûktir e. Bi gotineke din, salên te pênce û yek...  
û  
ew jî duwanzdeh... de ka xelk ê çi bibêje? Ma xelk ê bi me nekene?...  
Ka  
tu dev ji hertiştî berde... destê xwe bide ser dilê xwe û bi rastiya  
Xwedê  
bibêje. Ma tu û wê keçîka duwanzdehsale... ma ne tiştêkî dûrî  
aqilan e?«

Beriya ko tiştêk ji devê bavê min derkeve, diya min got:

42

»— Ma tirsî ji Xwedê û şerma ji pêxember li ba wî heye!« Bavê min berê xwe bi diya min de kir û bi tevgereke serbilind û zana gotê:

»— Bi wî serê xwe î piçûk rêyan nede ber min... tirs û şerma çi!  
Gelek

jinên pêxemberê me jî hebûne, hemû jî hipûhelal!... û dema ko bi hezretî

Eyşê re zewucîye, salên wî jî di ser pênceyî re bûne... li gor ko tê gotinê,

hezretî Eyşe ji keça mala feqî Dimso jî piçûktir bûye wê çaxê.« Navê pêx-

emberan, navê hezretiyên dengê rebena diya min birî û di ber xwe de kire

hîskehîsk. Di wê gavê de dilê min pir bi vê rewşa wê şewitî, xwîn di min

de keliya û bi wê kelê ez li bavê xwe vegeyriyam:

»— Wê çaxê... ew berbora ereban e... berbora ereban e ko merivekî salmezî rabe bi dergûşeke neh û dehsale re bizewuce... ma tu jî ereb î!...«

Bavê min têderxist ko ez çiqasî nerihet bûme. Bêyî ko şerm bike, destê

xwe jî li ba kir û got:

»— Ma em jî ne ji ometa mihemed in?... şerm nakî tu van gotinan dibêjî, kafir!... Xwezika min tu neda ber vê xwendina kafirane!« Ev cara

pêşîn bû ko bavê min xwendinên weha bi rengdêra kafirane  
dinavand û

li min hêrs dibû. Min ev tevgerên wî da xatirê vê daxwaza zewaca  
wî û...

û li vir nebaşiyên çîrokên dêmariyan jî hatin bîra min, xoce. Ez kurt  
bibirim, min jî êdî dengê xwe ne kir û bêyî ko ez wê rojê solan ji lingê  
xwe

bikim, ji bo çûyînê rabûm ser xwe, li ser lîngan min bi bavê xwe da  
zanîn

ko ew vê yekê bike, ez ê gelekî di ber wî de şerm bikim. Min kir ko  
ez jê

re bibêjim zewaceke bi miriyan re gelek çêtir e ji zewacên weha, lê  
min ev

gotinên xwe jê re ne got. Min tiştêkî din pê da zanîn û gotê:

»— Ko tu vê zewacê bikî, ez ê diya xwe bigirim ba xwe û em ê biçin...  
em ê ji te dûr biçin.« Bi vê gotina xwe re ez derketim û bi şûn de  
veg-

eriyam bajêr. Ha... beriya ko bigêhîjim bajêr... a li vir, (destê xwe  
ber bi

hêla rastê radike, axpîna li teniştê dibistanê pîşan dide.) li vê axpîna  
ha ez

rastê Dimso hatim. Dimso î ko bavê min rengdêra feqîtiyê jî bi pêşiya  
navê wî ve dizeliqîne û dibê: feqî Dimso. Lê dû re tu ê jî têderxî ko  
ew bi

xwe bi lîtireke dims nake. Piştî silav, xêrhatin û gotinên vala, min pê  
da

zanîn û gotê:

»— Ev danûsitendinên bavê min û mala we, ne tiştêkî maqûl e, feqî

Dimso.« Feqî Dimso çi li min vegeîne?... mîna her ehmeqekî, wî jî  
li  
min vegerand û:  
»— Firqûz û xêrnexwazên gundê me pir in, Gebran...« got, »ma em  
ê  
yekî ji bavê te çêtir bibînin!« Min kir ko ez bibêjim: Ji wî û vê tevgera  
wî  
xirabtir tiştek tune. Lê min ev gotinên xwe ji feqî Dimso re ne got.  
Min  
43

dizanî bû ko gotinên min pere nakin, min dizanî bû ko ew jî yekî ji  
wan  
e... yekî ji van tîpên nexweş e! Û ez serê te jî neyêşînim, xoce. Min  
ce-  
jnerojên xwe li bajêr di oda xwe ya piçûk de buhurand. Bi qasî du  
heftan  
ne çûm xwendinê. Ji ders û hevalên xwe mam. Hefta sisiyan ez  
têgêhîş-  
tim ko di dersxanê de nikanim guhdariya dersan bikim. Hiş û aqilê  
min  
li ser rewşa dê û bavê min bû û tiştek ne diket serê min. Di dawiya  
dawîn  
de êdî min jî ders û xwendina xwe li cî hişt û ez hatim gund... ez  
hatim  
gund, min diya xwe li hewşa mala apê xwe dît. Bi çavekî şilekî xwe  
havête

ser min. Bi min da zanîn ko bavê min bi gotina xwe kiriye û zewucîye. Bi hesp û silawatan, bi sitran û elbanan dêmariya min hanîne. Li oda me ya mezin piştên xwe sipartine balîvên nexşîn û li ser kulavên mor şerbet vexwarine, hedîsên pêxemberan xwendine, fermana Xwedê û qewlê pêxemberan bi lêv kirine û anuha... piştî zewaceke pêxemberane bi qasî sêzdeh salan ji min piçûktir dêmariyeke min heye, xoce. Piştî bihîstina van bûyeran, xoce sedemên vê dilverîşiya Gebranê Baço têdigêhîje, lê dîsa jî dixwaze vê diltengiya wî li ber belav bike û dibê: — Ev jî zêde ne xem e, birayê Gebran... ya rastî xem e, lê ne xema min û te tenê ye. Di avahiya civakan de berborên kevin û kufikî hene û berde-wam e jî. Ev di her civakekê de bi rengê derdikeve pêş. Di civakên me de jî bi van rengan çewtî hene, kêmasî hene... te bivê jî û nevê jî ew ê her-tim hebin. Lê... divê meriv hêdî hêdî û ji tiştên piçûk dest pê bikin. Bi gotin, bi peyivîn, bi bêhneke fere û yek bi yek. Gebranê Baço destê xwe ber bi gund radike û dibê: — De îcar bifikire ko di vî gundî de, ne tenê bavê min û ne tenê apê

min... gişt... yek ji yekî xirabtir e. A piştî çend mehê din tu ê bi xwe jî

bibînê bê çî ehmeq, saxik, kêmaqil û rengdîn... tu ê bibînê ko...

Mamoste Kevanot destê xwe dide ser milê Gebranê Baço, peyva wî dibire, xwe hinekî ber bi pêş, ber bi wî ditewîne û dibêje:

— Ez dizanim, birayê Gebran, ez dizanim ko ez ê yek bi yek van hemû

rengan bibînim, lê divê meriv... ez bi xwe... ez ji te re sond dixwim ko ez

ê dîsa jî ji wan nerevim, ez ê li ber xwe bidim û nola hunermendekî têke-

vime nava wan, rengên nû, rengên baş û çêtir pêşanî wan bidim. Îcar ev

hemû tiştên ha jî... wek ko min got û ez careke din jî ji birayê xwe re

bibêjim, ev hemû tiştên ha bi gotinê, bi peyivînê û bi nimûnegîniya meriv bi xwe dibe.

Gebranê Baço baş têdigêhîje ko mamoste Kevanot ji ya xwe danekeve,

li ser xwî û tevgerên gundiyan li hev nakin, bi rewşeke bêhêvî zîq li çavên

44

wî dinêre û dibê:

— De baş e, xoce... Xwedê bi te re be!... Xwezika em bi hev re nemi-rana... xwezika ez jî li vî gundî bimama, carina em bihatana ba hev û li ser



vê yekê dîsa em têketana galegalên vê mijarê. Lê ez weke kefa  
destê xwe  
dizanim ko te ê wê çaxê û dîsa li vir ji min re bigota: »Birayê Gebran,  
ev  
dîtinên te çiqas rast derketin!« Lê mixabin, xoce... ji ber wê sedema  
ko êdî  
tu jî pê dizanî, sibe zû ez ê diya xwe bigirim ba xwe û biçim. Ji vî  
gundî  
dûr, ez ê li bajarekî biyanî bimînim. Lê beriya ko biçim, ez dixwazim  
van  
gotin û dîtinên xwe ducar bikim û weke şîreteke biratîyê dîsa ji te  
re  
bibêjim: Li vî gundê ha du jiyana li ber te ne, xoce. Jê yek jiyana van  
gundiyan e, ya duduyan jî jiyana te bi xwe ye. Tu destê xwe li kîjanê  
datînî, êdî tu û kêfa xwe.  
Bi van gotinên xwe re Gebranê Baço çentê xwe î ko li kêleka xwe  
sîpar-  
tiye lingê sandaliyê digire, vedike, di ber xwe de bi pilepil:  
— Xuyaye... nîgara van tîpên gundê me bi gotinê nabe û bi nivisand-  
inê jî... dibêje, gurozeke kaxez ji çentê xwe derdixe, dirêjî mamoste  
Kevanot dike û didomîne: Binêre, xoce, li ser vê rewşa gundê me,  
min  
dest bi nivisandina pirtûkekê kiri bû. Ne qediyaye... ew tiştê ko di  
ser û  
dilê min de bû û min dixwest ez bidim, pêk ne hat. Bi gotineke din  
ez bi  
ser ne ketim... min xwest ko ez... fermo, ez vê destnivîsa xwe  
bidime te û

tu bixwîne. Hêvîdar im ji bo têngêhîştina vî gundî û van şêniyan piçekî alîkariya te bike.

Gelekî kêfa mamoste Kevanot tê, bi kêfxweşî wê guroza kaxezan ji dest

Gebranê Baço digire, piştî ko çend rûpelan jî di ser hev de diqulibîne,

pesinê wî dide û dibêje:

— Binêre, a ev karê ha karekî pir hêja ye, birayê Gebran. Xwezika te bidomanda û ev karê pîrozwer biqedanda... ez gelekî pîroz dikim ko te

dest bi tiştêkî weha kiriye. Karên weha, karên pîrozwer in... te kêfa min

hanî.

Li wir, li ber dîwarê lojmana dibistanê du cixarên din jî di nava tilî û lêvên wan de dişewitin, bi dûyên cixarên wan re pêlên galegalên di navî-

na wan de weke tîrêjên roya ko anuha li asoyên dûr tînsivik û ziravtir dib-

in, bi roavayê re Gebranê Baço serjêrî gund û mamoste Kevanot jî tev wê

guroza kaxezên karê pîrozwer derbasî hundurê lojmanê dibe.

45

Xwendevanê hêja!

Ez dizanim, ez baş dizanim ko tu ê anuha gazinan bikî û bibêjî:

»Dereweke din jî, bi qasî pirtûkekê mezin, dereweke din jî kete hustuyê

min ko ez bixwînîm.« Di vê yekê de ez bi te re! Ne tenê ez û tu,  
herweha  
pirî caran niviskarên mezin jî gazinan ji babetê niviskariya îroyîn  
dikin û  
bi devê xwe dibêjin: »Meriv maceraperestekî ramanê ye. Ji gelek  
sedsalên  
dûr û heta nuha hertim ramiyaye. Pêşiyê li ser text û keviran bi  
awayekî  
piçûk, dû re li ser kevirên daçikandî, li ser sîlîndirên ji deremên sipî,  
li ser  
papîrusan bi hîyeroglîfiyê ramiyaye. Anuha jî di pirtûkan de di  
navîna du  
bergan de dirame.  
Nebaştirîn hêla pirtûkekê jî ev e ko di navîna du bergan de  
nixumandî  
ye. Li ser zinaran, li ser kevirên daçikandî nivisandina derewan pir  
çetin  
bû. Ji ber ko tava royê gelek dijwar bû. Lê wî merivî, tavilê xwe  
vekişand  
qurmê daran, hundurê şikeft û îbadetxanan ko bikani be li gor xwe  
ciyekî  
peyda bike û tê de xwe bi xwe ji xwe re derewan li hev bîne. Pirtûk  
jî  
şikefteke binê erdê, şikefteke dubergîn e. Ji wê çêtir jî cî tuneye ko  
meriv  
tê de xweş derewan bike.« Niviskar (D.H. Lawrence) rast dibêje, tu  
rast  
dibêjî û ez jî bi we re, xwendevanê hêja!

Rast e... rast e ko karê nivisandinê pirî caran weke lihevhanîna derewan

e. Bi ruyê dunyayê ketine... ez dibêjim niviskar, tu bibêje qeşmer...

a ev

yên ha bi ruyê dunyayê ketine, ji xêra kaxez û pênûsên Xwedê bêyî ko li

xwe, li hundurê xwe, li rastiya xwe vegerin, bi navê novel û romanên çêlî

darên dikin ko çend pel û çend gilîçek pê ve şîr tîr, an jî çêlî evîna pisikan dikin... kûçik çawa bi hevdu ve dimînin û gelek tiştên weha...

Wek ko min got, heta derekê ez bi te re. Lê ez ji te re bi serê xwe û wan

hemû serên pîrozwer sond dixwim û dibêjim: heta ko ji destê min were

ez ê xwe ji vê rengdêra bêrûmet biparêzim. Min tew dil nîne ko ez ji te

re derewan li hev bînim. Bawer bike ko pêwîst jî nekira, ne min ê serê

xwe bêşanda û ne jî min ê ewqas wext li te biherimanda. Bi gotineke vekirîtir, di gundê me de pirseke min û şêniyan heye ko divê were bersi-

vandin û safî bibe: Ew ji min re dibêjin, ev ji serê xwe çelq bûye, dîn bûye. Û ez jî... rast e, ez jî bi barana vî gundî şil bûme lê... lê anuha

ez ji

46

wan re tiştê nabêjim. Ez ê dû re bi lêv bikim.

Lê ji anuha ve ez bi navê xwe û hemû şêniyên gundê xwe ji te lava dikim  
ko tu piştî xwendina vê pirtûkê destê xwe bidî ser rastiya Xwedê,  
bê tirs û  
bê şerm bibêjî... bibêjî ka ji me kî neheqê Xwedê ye.  
NOT: Ez ê li vir nav û paşnavên wan, navê ber û eşîrên şêniyên gundê me  
neynim ser pozê pênuşa xwe. Ez ê wan bi etîketan binavînim,  
etîketên  
ko wan bi awakî kolektîf bi hevdu ve zeliqandine. Ji bilî van etîketan,  
bi  
gotineke din, ji bilî van nav û naznavên ko wan li hev kirine, ez ê  
rengdêr  
û naznavêkî din bi kar neyînim. Gerçê ev naznavên ko wan li hev  
kirine  
tew jî naşibin navên naz, gotin di navîna me de, lê rengdêrên genî  
ne.  
Dîsa jî... dîsa jî şêniyên gundê me ne tenê di demên naxoşî û  
pevçûnê de,  
ne tenê di demên henek û fesadiyê de, meriv dikane bibêje ko di  
hemû  
roj û wextên Xwedê de jî ew van etîketan bi kar tînin û bi hevdu ve  
dizeliqînin. Divê ez li vir bidime zanîn ko ji bilî şêniyên gundê me  
kesekî  
din bi van rengdêran nizanin. Ev jî baştir e ko... peyvikên ko li gundê  
me  
hatine çêkirin weke hunereke wan di nava şêniyên gundê me de  
bimînin.

\*

Ko em mala seyda, lojmana dibistanê, mizgefta mala Xwedê û wan hemû

malên qereçiyên ko zivistanan tên û li vî gundî dihewin jî nebêjin, gundê

me bi heftê avahiyên xwe, di navbera çiyakî jêrîn û yekî jorîn de mexel

ketiye. Gundê me ji dûr ve xwediye dîmena gundekî nola hemû gundan

e. Jora wî rez û weke hersal jêra wî jî bîstan û pîvaz e. Roavayî gundê me

bi kevir, bi şikeft û bi newalên kwîr in. Li hêla rohilat jî... li wir jî goristan

û Mekanê Mala Dînan.

Mekanê Mala Dînan di nava miriyên salan de, li vî goristana gundê me

xwediye rûmeteke bilind e. Xêr û guneh li hustuyê şênîyên gundê me,

rast û derew para wan be... lê li gor ko tê gotinê, dibêjin gelek devên xwar

li vir rast bûne, qotik li vir ji nava colên pezan reviyane, gelek dayikên his-

tewir, xwe havêtine bextê vî Mekanê Mala Dînan.

Çi bi ro û çi bi şev, ev Mekanê Mala Dînan bi darên xwe yên kevnare tirs û tariyeke mezin dadigire ser gundê me. Ji çar sed û bîst şênîyên gundê me bi kêmanî heşt kesên wan har, dehê wan dîn, bîstê wan cinî,

sedê wan ehmaq, du sedê wan saxik... û yên mayî ne diyar in.

Bi gotineke din... a li vir ez ê gotina xwe ya ji bo wan bibêjim, ez ê  
47

bibêjim: ko meriv dora gundê me bi keviran dîwar bike, derî û  
penceran

di vî dîwarê dora gundê me de veke, weke personelên pêwîst  
asîstan, dok-

tor û psîkologan bîne gundê me, wê çaxê... wê çaxê rasterast  
tîmarx-

aneyeke rengîn ê ji vî gundê me derkeve.

Lê ko we bivê, em ji taxa jorîn dest bi nîgara malên gundê me bikin.

Li

rojavayê bakurê gundê me bîreke mezin heye. Piraniya malên  
gundê me

ava xwe ya vexwarinê ji vê bîrê hildikêşin, dewarên xwe li ser vê  
bîrê av-

didin û gelek caran, tenên xwe jî dîsa li ser vê bîrê dişon. Ji ber vê  
yekê, ji

berbangê heta derengî şevê jî ji şêniyên gundê me hertim çend kes  
li ser

vê bîrê peyda dibin.

Lê pîrozweriya vê bîra gundê me ne tenê ji fonksiyona avê ye,  
herweha

weke ciyekî hevdîtinê jî rolekî xwe heye. Keç û bûkên ko bixwazin  
(keç û

bûkên gundê me hemû jî vî tiştî dixwazin.) fesadiya yekê an jî çêlî  
xortekî

gundê me bikin, hebûna vê bîra me ji bo wan rêyeke herî baş û  
dayîneke

Xwedê ye. Lê min dixwest ko ez dest bi nîgara malên gundê me bikim.

48

MAL: 1

Li kêleka vê bîra mezin, mala Poznîkal î gavanê gundê me heyê.

Navbera

mal û bîrê bi qasî sê werîsan e. Pencera oda mala wan rasterast li pêşberî

vê bîrê ye. Bi gotineke din, ji bo keç û xortên gundê me ciyekî stratejîk e.

Lewra gelek xortên dildar tên mala gavanê me, di vê pencerê re li keçan

dinêrin, (ne tenê keç, di gundê me de mêr hene ko li jinan jî dinêrin.) dest

û destmalên xwe ji wan re dileqînin û tew carina di vê pencerê re neynikan jî didine çavên wan. Ji ber vê yekê ye ko di bêrîkên hemû xort

û heşaşên gundê me de hertim neynikek peyda dibe.

Li vir tiştê herî seyr ev e ko hemû gundiyên me jî bi wersira vê malê û

vê pencerê dizanin. Lê kesek zêde dilê xwe teng nake. Gerçî sê sal beriya

nuha çend kesên xwediyên namûsên mezin li vê yekê varqilîn, bi hêrs û

gef hatin ber deriyê mala gavanê gundê me, peyv li ruyê hemû endamên



malê xistin ko ew wê pencera mala xwe dîwar bikin. Lê Xwedê li ruyê keç

û xortên gundê me mêze kir (ji vî aliyê de carina Xwedê li ruyê gundiyên

me mêze dike.) û Poznîkal î gavanê gundê me jî weha bersiva wanda:

— Ez ji we re vekirî bibêjim. Pencera mala min, pencera dilan e û pencerên weha pîrozwer jî nabe ko meriv dîwar bikin. Ko we bivê, wê

çaxê kerem bikin, serê min û zarokên min jêkin û weke keviran pê pencera mala min dîwar bikin.

Ji wê rojê û vir de ye ko ev gotinên gavanê gundê me di nava keç û xor-

tan de bûye şiyareke benîştane. Daxwazeke wusa li wan rabûye ko ew van

gotinên Poznîkal î gavanê gundê me li zinaran bikolin, li dîwaran binivisînin.

Lê mala gavanê gundê me ne tenê bi keç û xortan xweş in. Bi gotineke

rastirîn, mezin û piçûkên mala gavanê gundê me hemû jî zarxweş, xwînşêrîn, bi mezinan re mezin û bi piçûkan re piçûk in. Dibe ko ev yeka

ha ji fonksiyona gavaniyê be. Lê ji çî dibe bila bibe, li vê dunyayê tiştê herî

giring ew e ko meriv bi herkesê xweş be û li gor dilê herkesê be. A ev mala

gavanê gundê me jî maleke wusa ye. Nefspiçûk in. Tiştêkî ko li gor pî-

vana şênîyên gundê me xirab be jî, ji bo mala Poznîkal î gavanê gundê me

49

pir normal e. Serqisê, sê sal beriya nuha mamosteyekî me î heşaş hebû. Di

pencera (ew pencera ko xwendevan pê dizane) vê malê re keça seydayê

me ji rê derxist û rojekê dîsa di vê malê de ew maç kir. Lê endamên xwediyên malê tew jî dilê xwe teng ne kirin û ji wan re ne gotin: hûn mala

me bi kar tînin. Bi gotineke din, di vî gundê me de mala herî demokrat,

mala Poznîkal î gavanê gundê me ye.

Tenê aliyekî wan... aliyekî wan î seyr heye ko şênîyên gundê me jê nax-

oş in: çi rast çi çewt, çi bûyer û gotinên ko bigêhîje vê malê, endamên vê

malê di dest de li ser dipeyvîn, şirove dikin, biryara herî dawîn jî didin û

wan gotinan, wan bûyeran gêrî hewşê dikin, ji wir radikin û li kuçên gund belav dikin. Ji xwe ew bûyera mamostê me î heşaş û keça seyda jî

dîsa ji vê malê belav bû bû.

Çawa dikin, bi çi huner û çi jîriyê wusa zû belav dikin, ew êdî Xwedê pê dizane. Ji ber van tevgerên wan, rîsipiyên gundê me dû re hevokek jî

bi pey vê mala gavanê gundê me xistin û gotin:

— Fis di mala Poznîkal î gavanê me de disekine, lê qise nasekine!  
50

MAL: 2

Li hêla jêrîn, bi vê mala gavanê gundê me ve xaniyekî mezin î li ser  
du

qatan heye. Avahiyeke xweşik e û ev avahîya ha bi destên xwediyên  
malê

hatiye avakirin. hemû mêrên ko ji vê malê derdikevin, hîn di  
xortaniya

xwe de dest bi lêkirina dîwaran dikin û herweha hemû  
dewlemendên

gundê me jî xaniyên xwe bi mêrên vê malê didine lêkirinê. Bi  
gotineke

din, mêrên ko ji vê malê radibin, nanê xwe ji keviran derdixin. Lê  
wek ko

xwendevan jî pê dizane, ev hevoka ha bi gelek aliyên xwe yên  
negatîv,

bêhneke metelokî jî dide. »Nanê xwe ji kêvir derdixin« tê maneyeke  
din

jî: bi çî awayî dibe bila bibe, ew ji heq xwe derdikeve.

Lê awayê ko di gundê me de li ser vê malê tê gotinê ew e ko ev mala  
ha

bi virekiyê, bi fesadiyê, bi dekûdolaban ciyê xwe çêdikin û ko  
biqewume

nangermiyê dikin û karê xwe li hev tînin. Di van salên dawîn de  
şênîyên

gundê me di dewsa peyva nangermiyê de, gotineke din bi kar tînin  
û  
dibêjin: quzekiyê dikin. Li gor gotinên salmezinên gundê me, dibêjin  
ev  
mala ha ji berê de wusa ye. Wê çaxê jî meriv têdigêhîje ko ev xwiyê  
mez-  
inên vê malê herdem weke mîras ji zarokên wan re dimîne. Ev xwiyê  
wan  
ne tê kirînê, ne tê firotinê û ne jî tê guhertinê.  
Di roja îroyîn de jî sermiyanê vê malê merivekî bi bejneke bilind,  
sim-  
bêleke sor û gir e. Şêniyên gundê me navê Simbêlboq li vî zatî kirine.  
Dema ko kincan li xwe dike û di kuçên gundê me de dimeşe, tirsek  
dikeve dilê meriv. Lê şêniyên gundê me baş pê dizanin ko bi vê  
simbêlê,  
bi vê bejnê bizdonekekî wekî wî li dunyayê jî peyda nabe. Li gor  
gotina  
gundiyekî me, ev zatê ha di şerekî gundê me û gundekî cîran de li  
paş  
zinarekî mezin xewirîye. Loma di nava malên gundê me de pê  
henekan  
dikin û dibêjin:  
— Divê meriv bejn û simbêla simbêlboq pêşanî dijminan bide û bi  
şûn  
de vekişîne.  
Lê pirî caran jin û bi taybetî jî jinên gundê me dilên xwe li tîpên weha  
datînin. Ev zatê ha, bi gotina gundiyên me, Simbêlboq, xwedyê du  
jinan

e û her jinek jî bi rengekî ye; jê yek kej û ya din jî bi rengekî reş î  
naxoş e,

51

ji van reşên ko... na, nabe ko ez bi lêv bikim. Hejmara zarokên  
Simbêlboq... ez pê nizanim. Ji xwe ne ewqas girîng e jî. Ya girîng ev  
e ko

meriv bizani be di roja îroyîn de ji van herdu rengan gelek zarok li  
hewşa

mala Simbêlboq hene û weke genim û garis, meriv dikane van  
zarokan ji

hev derxîne. Ji bilî van herdu helalên xwe, Simbêlboq bi çend  
jinebiyên

gundê me re jî li ba dikeve. Xêr û guneh li hustuyê şênîyên gundê  
me, lê

ev heşaşiyên Simbêlboq bi awakî wusa têne gotinê ko ji romanên  
heşaşiyê

jî bêtir bala merivan dikêşînin. Gelek caran pê dan zanîn, ew ji vê  
rewşa

wî haydar kirin û jê re gotin:

— Wext bêwext neçe malên jinebiyan, navnotî ê bi pey te bikeve.

Lê di her careke weha de jî wî li wan vegerand û got:

— Bila tişteki xirab neyê ser hişê we, ez diçim alîkariya wan dikim û  
ji

wan re êzingan hûr dikim.

Lê bi çend rojan beriya nuha di kadîna mala jinebiyekê de hate girtin  
û

ji dêla ve ko dîsa çêlî hûrkirina êzingan bike, rabû li riya helaliya vê  
yekê  
geriya û ew jinebiya ha ji xwe re xwest. Li gor gumanên şêniyên  
gundê  
me, li gel van hersê jinên xwe jî çavên Simbêlboq dîsa li der e. Li gor  
xwiyê xwe yên taybetî, xwendayên xortên gundê me navek li vê  
malê  
kirine. Dibêjin: mala donjuan. Xort û xwendayên gundê me, ji  
kubariya  
xwe van peyvikên weha sergirtî an jî biyanî bi kar tînin. Wusa dikin  
ko zû  
bi zû neyê famkirinê. Lê pirî caran zimanê mezinên şêniyên gundê  
me  
van peyvikên sergirtî an jî biyanî nahewînin. Pêşiyê wan rengdêreke  
wusa  
vekirî wusa vekirî bi kar hanîn ko anuha ez nikanim bi lêv bikim. Lê  
anuha hinekî nerm kirine an jî guhertine û dibêjin: mala doxînsistan.  
Ev  
rengdêra ha ji rengdêra donjuaniyê çêtir dixuye û baştir jî li ciyê xwe  
rû-  
dine. Ji ber ko ne tenê mêrên vê malê, herweha jin û keçên vê malê  
jî we-  
ha ne. Ev serê demekê ye ko dibêjin berzewaca keça mala  
doxînsistan  
başwala li hewşê rûdine, dawa xwe di ser çoga xwe de diqelibîne û  
dest bi  
şuştina kincan dike. Xêr û guneh li hustuyê wan lê... dibêjin, ev keça  
mala

Simbêlboq ji piya jî mîza xwe kiriye.

Û ji ber vê yekê ye ko gelek xort û naşiyên gundê me wext bêwext riya

xwe bi vê hewşa mala Simbêlboq î gundiyê me dixin û bi ava gunehkariyê

çavên xwe dişon.

52

MAL: 3

Li jêra vê malê jî bi hewşeke fere maleke mezin heye. Di nava malên gundê me de mala herî mezin û fere bêguman ev mala ha ye. Ev mala bi

qasî sî û sê serî şênîyên xwe hene. Di her rojên Xwedê de têrek arvan di

hewşa vê malê de dibe hevîr û li ser sêlê dibe nan. Dema ko meriv dibîne

di vê hewşê de amadeyiyên şivê çêdibin, meriv dibê qeyê mewlûdek an jî

şahiyek heye. Lê ne wusa ye. Ev nan û ev şiva ha ji bo van sî û sê serî en-

damên vê malê ne.

Piçûk û mezinên endamên vê malê di nav hev de bi tiştêkî seyr bi hev

ve hatine girêdanê. Ne kesek û ne jî tiştêkî din dikane wan ji hev dûrxîne... na tenê tiştêk... tenê tiştêk dikane wan ji hev veqetîne û ew jî

mirina bi destê Xwedê ye.

Di xortaniya xwe de Kûpo î mezinê vê malê jî ev yeka ha ji herdu bi-

rayên xwe yên piçûk re gotibû bû... goti bû:

— Heta mirinê jî em ê bi hev re bimînin û bijîn.

Ji wê rojê û vir de ye ko ew hersê birayên şîrpak tev jin û zarokên xwe

hemû jî di vê malê de li ser hev in. Ji bilî wan keçên ko ji vê malê û di vê

malê de dibine jin, ew keçên ko ji derve jî tên û li vê malê dibine jin, êdî

nikanin ji vê malê derkevin. Bi gotineke din, mîna mêşa ko bikeve kûpê

dimsê û pê ve bimîne, keça ko li vê mala Kûpo bibe jin êdî heta mirinê li

vir e. Ev tişta di vê malê de bûye rêdarek û dimeşe. Ji ber vê yekê keçên ji

vê malê hertim çavlider in, hêviya mêrekî derveyî malê dikin. Lewra ew

dizanin... dizanin ko ew carekê keçaniya xwe li vê malê bi pismamekî xwe

re kevin bikin, mana wê ew e ko ew ê heta mirinê jî di vê malê de bimînin.

Bi qasî sal û nîvekê beriya nuha ji birayên Kûpo, yê navîn dimire. Ne girîng e ko ji ber çî, lê Kûpo û Çavbeloq î birayê xwe yê piçûk li ser jin û

namûsa birayê xwe î rihmetî dipeyivin û bi hev dişêwirin. Ji bo ko namûsa wan nekeve ber destên xelkê, Çavbeloq pêşniyarekê davêje ber

birayê xwe î Kûpo û jê re dibê:



— Bila bi biraziyê min re... em bi lawê te re bizewucînin. Herçiqas salê

biraziyê min hîn ne bûye sêzdeh... lê xem nake.

53

Kûpo î mezinê malê daxwazeke din ji Çavbeloq dike û pê dide zanîn ko

ew bi jina birayê xwe î rihmetî re bizewuce. Bi qasî salekê beriya nuha

Kûpo î mezinê malê jina birayê xwe î rihmetî li Çavbeloq î birayê xwe î

piçûk helal kir. Wî ev yeka kir lê mîna ko Xwedê ji wan re bibêje hûn çewtiyekê dikin, çar meh berê jî Çavbeloq î birayê Kûpo mir.

Helal û heramiya vê yekê, ew êdî Xwedê pê dizane, lê di roja îroyîn de

herdu jinbirayên Kûpo di vê malê de bi wî mane. Heta nuha jî li ser vê

yekê şirovên şêniyên gundê me belav ne bûne.

54

MAL: 4

Ko meriv di vê şîpa malên gundê me de ber bi jêr bimeşin, li rojavayê jêra

gundê me xaniyekî din î li ser du qatan heye. Ev xaniyê ha mala Hecî Nîvçe î dikandarê gundê me ye. Ji bilî vê dikana Hecî Nîvçe jî, di roja îroyîn de dikan an jî çerçiyê gundê me tunene. Dikan an jî dikandar hene

ko piştî demekê wenda dikin, an jî karên wan li hev tîn, bi ser dikevin û demên dewlemendiyê bi wan ve xuya dibin.

Lê ev dikan an jî Hecî Nîvçe î dikandarê gundê me ne wusa ye. Bandora enflasyon û develuasiyonên herî xurt jî lê nabe. Ji xwe tiştên ko dikandarê me difiroşe jî ne ewqas gelek in. Ko ne ji du sê zarokên nerind be, carina heta sê çar mehan jî ev dikandarê me muşteriyekî li ber derê mala xwe nabîne. Lê dîsa jî dema ko derzîyek an jî kevirekî çaqmaqan ji yekî re pêwîst bike û biçe li deriyê mala Hecî Nîvçe î dikandarê gundê me bixîne, hûn wê çaxê li serbilindiya wî binêrin! Xwedêyo, di wê gavê de destê wî di çî karê de dibe bila bibe, ew ê bi bextiyariya dikandarekî mezin wî karê ha ji destê xwe berde, hêdî hêdî ber bi deriyê oda raketinê biçe, derî veke, ji refikek jora caxên nivînan sandoqeke piçûk daxîne xwarê, kilîtên xwe ji ber pişta xwe derxîne û yek bi yek lê biceribîne heta ko yek lê tê. Pirî caran ew bi xwe jî bi ser ve nabe ko ji kilîtên wî kîjan kilîta vê dikana piçûk e.

Mîna yekî ko nû bi ser fonksiyona peran ve bibe, hertiştî bi peran

dipîve û ji bo hertiştî peran dixwaze. Ji bo wî ne girîng e ko pereyekî  
pir  
an jî hindik e. Çi mezin çi piçûk, pere pere ne ji bo wî.  
Firqûz û nerindên (firqûz û nerindên gundê me pir in.) gundê me bi  
vî  
xwî û tevgera Hecî Nîvçe dizanin. Dema ko dibînin nîr û halet li ser  
piyê  
wî ye ew ê biçe cot, an jî das û werîs li ser piştta kerê şidandiye û ew  
ê biçe  
çilo, wê çaxê... a wê çaxê ji van firqûzên gundê me yek radibe heta  
axpî-  
na paş malan bi pey Hecî Nîvçe dikeve û pê dide zanîn ko dixwaze  
ke-  
virekî çaqmaqan bikire. Bêyê ko bibêje na, Hecî Nîvçe ê xwe ji karê  
xwe  
bike, vegere malê, biçe ber wê sandoqa xwe ya piçûk û kevirekî  
çaqmaqan  
bifiroşe vî firqûzî. Tew hinek nerindên wusa hene ko dibêjin bila ew  
jî bi  
55

deyn be û dixwazin vî deynê xwe heta demên bânderan bidin  
sekinand-  
inê. Lê dîsa jî Hecî Nîvçe ne li dilê xwe digire û ne jî bêhna xwe teng  
dike.  
Tenê di ber xwe de:  
— Na, dibêje, ez li ser sonda xwe me, bi deyn nadim. Deyn nexşên  
bêy-

omiyê ye!

Lê ko meriv ji Hecî Nîvçe bipirse û bibêje, çawa rengê bêyomiyê ye,  
wê

çaxê ew ê ji we re serpêhatiyê weha bi lêv bike:

»— Li gor danezana termînalên otobûsên hecacan, diviya bû ez jî  
wê

rojê saet di nehê sibê de li bajêr li ber termînalê bûyama. Ez wê sibê  
rabûm ko di wextê de biçim ser rê, dest li temafîlekê bilind bikim û  
xwe

bigêhînim termînalê hecacan. Kesên ko bi min re rast dibûn, li  
axpîna

paş malan min xatir ji wan xwest. A hemû jî sax in û pê dizanin.  
Beriya

ko xwe bigêhînim ser rê, min bihîst ko ji paş ve dengê li min bilind  
dibe.

Li paş xwe zivirîm ko ev xortê mala Zîpo bi pey min ketiye. Xwedê  
jê re

nehêle, firqûz!... Lê vegeriyam û min gotê:

— Te xêr e?...

Bi min da zanîn ko dixwaze kevirê çaqmaqan bikire. Lava kir, li ber  
min geriya û got:

— Xwedê heca te qebûl bike, hecî!... Ko ez anuha peyda nekim,  
heta

ko tu vegeî jî ez ê bê kevir û bê çaqmaq bimînim, hecî...

Min dilê wî ne şikand. Ji wir, ji nêzîkî rêya temafîlan ez û wî... em bi  
lez

vegeriyan gund. Li malê, li ber sandoqa tiştan, min kevirê çaqmaqan

derxist û dan xort... du lib xwestin... û dû re vegeriya ser min, bi  
hus-  
tuxwarî ji min pirsî ka bi deyn dibe an nabe. Dibe, nabe. Ev du  
peyvikên  
ha di navîna min wî de çûn û hatin. Min çêyîyek pê kir û gote wî:  
— Baş e, heta ko ez vegerim...  
Min dîsa da ser rê û ez çûm. Lê heta ko min xwe dîsa gihand ser rê,  
temafîlên sibê ne ma bûn. Li taştiya temafîlek hat, min destê xwe lê  
rakir,  
ne sekinî. Ji şeytanî re wê rojê temafîl dagirtî bû. Cî tune bû. Li jora  
temafîlê jî gelek meriv rûnişti bûn. Ko bisekîniya min ê jî li jora  
temafîlê  
xwe bi derekê ve bizeliqanda, lê ne sekinî. Taştiya şikiya, yeke din  
hat.  
Sekinî. Ez lê siwar bûm. Lê heta bajêr jî ez bi tirs bûm, tirsî ko ez ê  
ji re-  
fê hecacan bimînim. Li termînalê tirsî min hate serê min. Ez jê  
mam.  
Karmendên termînalê bi min dan zanîne ko ew ê min bişînin  
termînala  
bajarekî biyanî. Min nêhirî ko nabe. Ne ziman û ne jî hogir... bi hêrs  
û  
xemgînî ez vegeriyam gund...«  
Ev sonda ha, li payîza sala çûyî, wê rojê, li axpîna paş malên gundê  
me,  
56

li pêş çavên şêniyan ji devê Hecî Nîvçe derketiye. Sonda ko bi deyn  
tiştan  
nafiroşe. Û ev navê hecîtiya nîvçe jî şêniyên gundê me wê rojê, li  
wê ax-  
pînê bi vî dikandarê gundê me ve kirine.

57

MAL: 5

Li perê rohilatî gundê me li hêla jorîn xaniyekî nizim heye. Dîwarê  
pêşîn  
î ko li gund mêze dike, bi qasî çar mîtroyan ji erdê bilind e û paşiya  
xênî  
jî bi qasî çend bihustan ji riya paş malê bilindtir e. Di navbera xênî û  
goristanê de ev riya piçûk tenê heye.  
Dema ko meriv di deriyê hewşa vê malê re derbasî hêla hundur  
bibin,  
li piştî pencera odê seriyekî rût ê bi ber çavên meriv bikeve. Ev serê  
rût  
serê Cefto î gundiyê me ye. Hertim perçek kaxiz, defter an jî  
pirtûkek di  
dest de ye û li ber vê pencerê rûniştî ye. Di rojên şil û tarî de li hêla  
hun-  
dur e, di rojên germ û ronahî de jî li hêla der e. Di hêla hundur de,  
di  
dîwarê ber sekûka xwe de refikeke piçûk çêkiriye, pirtûk û ew hemû  
kax-  
izên xwe yên ko têne xwendinê li vir dihewîne. Piraniya pirtûkên wî  
ji

van çîrokên oldariyê ne: Weke Rustemê Zal, Heretî Elî û Kerbela,  
Hêzên  
veşartî, Hunera Fal û Şirovên Xewnan... çî dibe bila bibe, di gundê  
me de  
yekî ko xwediyê refikeke pirtûkxane be, ew jî Cefto ye. Her gava ko  
wext  
lê were û guhdarekî peyda bike, wê çaxê ji guhdarê xwe re ji van  
pirtûkan  
yekî dixwîne. Di xwendina her hevokekî de jî bi qasî sê çar hevokan  
şirove dike, dîtînen xwe bi lêv dike ko baş têkeve serê guhdarê wî.  
Di her rojên Xwedê de du sê xortên gundê me li hewşa mala Cefto  
pey-  
da dibin, bi bêjîngan nokên sipî, çortan û toraqê dikişînin mala wî,  
daxwaz û şewata dilên xwe jê re vedikin, vedikin ko Cefto jî bi  
hunera  
xwe û van pirtûkan bersiva agirê evîna dilê wan bide û çareser bike.  
Pirî caran xortên gundê me diçin ba Cefto, gilî û gazineke (gilî û gaz-  
inên hemû xortên gundê me, kêz zêde wek hev in.) weha dikin:  
— Ez wekî dînekî ji keçikê hez dikim, lê ew tew li min jî mêze nake.  
Ez  
çî bikim?  
Wê çaxê jî Cefto î gundiyê me bi tevgereke ilimdarane pirtûkekê ji  
re-  
fika xwe ya dîwêr dadixîne, dixwîne û dibêje:  
— Biçe weha bike: Çel lib baqlên hişk peyda bike. Li ser deh libên  
wan  
Ya Hennán binivisîne. Li ser deh libên din Ya Mennán, li ser deh  
libên

mayî Ya Deyyân û li ser deh libên dawîn jî Ya Sultân binivisîne. Dû  
re

58

yek bi yek li ser her libeke baqle Amener Resûlu'yê bixwîne û bavêje  
na-

va agir. Dema ko tu davêjî nava êgir jî divê tu lava bikî û bibêjî:  
»Filankesa

keça bêvankesê weke van baqlên ha ji evîna min bişewite.« Ü piştî  
viya jî

divê sê Îhlâs û sê silawat were xwendin. Heta ko ev çel lib baqlên  
ha di

agir de bişewite, ew keçika te, ew ê jî ji evîna te bibe weke dînekê.

Ji bo xatirê ko li gundê me baqle peyda nabin, li gor meziniya ilmê  
xwe

Cefto î gundiyê me alternatîfeke din dide ber xortên gundê me û  
dibê:

— An jî vê lavayê bike: »Ya Kavî, ya Gânî, ya Alî, ya Velî, ya Azîz, ya  
Rahîm, ya Rab, ya Zu'l- Celal, zu'l Mecîd, fa'al lemma yezîd. Bîlheqqî  
áhîyyen bîrahmetîke ya Erhamurrahimîn.« Di ser tiştê xwarinê de,  
di

ser gul an jî destmalekê de vê lavayê bixwîne û pifî bike. Dû re vî  
tiştê

xwarinê bi keçikê bide xwarin, wê gulê an jî wê destmalê bide  
bînkirin. A

wê çaxê ew keçika ê xwe bide aliyê te û ji te hez bike.

Ji ber vê meziniya ilimdariya Cefto î gundiyê me ne tenê xortên  
gundê



me, hemû şêniyên me jî rûmeteke pêwîst didine wî. Bi taybetî dema ko

li ser xewn û vê pirtûka Şirovên Xewnan dipeyive, herkes dixwaze guh-dariya wî bike.

Lê piştî navnotiyeke bêyom hertişt serûbinê dibe û Cefto î gundiyê me

ji vê rûmeta xwe dikeve. Di roja îroyîn de di nava gundê me de navek jî

bi pey xistine û dibêjin:

— Ew jî doxînsistekî miriyê jinan e!

Xêr û guneh li hustuyê wan be, dibêjin di şirova xewna jinebiyekê de

destê xwe havêtiye pêsîrên wê û bi vî rengî gelek gotinên naxoş li nava

gund belav dibe. Jinebiya ko çûye ba wî, bi awakî kurt û sergirtî pê daye

zanîn ko di xewnê de nerindekî destê xwe havêtiye wê. Cefto î gundiyê

me jî di ser pirtûka xwe ya Şirovên Xewnan de xwar bûye, ji rûpeleke wê

hinek tişt xwendiyê û dû re gotiye:

— Wî nerindî, destdirêjiya kuderê te kir?

Jinebiyê hinekî şerm kiriye, serê xwe xistiye ber xwe, bêyî ko li ruyê Cefto binêre, herdu destên xwe ber bi pêsîrên xwe bilind kiriye û gotiye:

— Dest havête pêsîrên min.

Cefto careke din di ser pirtûkê de xwar bûye û gotiye:

— Destekî xwe, an herdu destên xwe havêtin te?

Jinebiyê bi ruyekî soromoro gotiye:

— Pêşiyê destekî xwe... destekî xwe ber bi min dirêj kir û dû re jî her-  
du destên xwe...

Cefto î gundiyê me hilmeke din di ser pirtûkê de xwar bûye, ponijiye  
59

û li jinebiyê vegerandiye:

— Ma te ne kir ko... tu xwe ji ber wan destên nerind biparêzî?... te  
xwe  
venekişand?...

Ji şermesariyê dev li jinebiyê hatiye girêdan û deng jê derneketiye.

Cefto pirsaxwe dubare kiriye û gotiye:

— Ma... te hewar ne kir?... Te ne kir qîreqîr?...

Bi ruyekî şermok û dengê nîzîm jinebiyê di ber xwe de:

— Na, gotiye, nayê bîra min...

Cefto rûpela pirtûkê lê qulipandiye, ji wê rûpelê jî çend rêzik  
xwendiyê,

dû re li ruyê jinebiyê nêhiriye û gotiye:

— Qêrîn û hewara di xewnê de ne tiştê baş e, ne xêr e... lê dîsa jî  
bîne

bîra xwe ka di wê gavê de te çî kir. Em bibêjin ko anuha tu di  
xewnekê de

ye û wî nerindî jî... a wî jî wusa destên xwe ber bi pêşîrên te dirêj  
kiriye...

Bi van gotinên xwe re Cefto î gundiyê me pêşiyê mîna xewgerekî  
her-

du destên xwe ber bi pêşîrên jinebiyê dirêj kiriye, dû re hustuyê xwe  
ber

bi ruyê jinebiyê dirêj kiriye, paşîngê jî xwe dirêj kiriye, jinebî dirêj  
kiriye...

Gerçî di nava şênîyên gundê me de tê gotin ko Cefto î gundiye me  
hîn

gelek tiştên din jî dirêj kiriye, lê em dirêj nekin. Em kurt bibirin û  
bibêjin... îro jî dema gundiyeke me dibîne ko Cefto li paş an jî li pêş  
wê

pencerê perçekek kaxiz dixwîne, di dilê xwe de an jî bi dizî weha  
dibêje:

— Dîsa dixwîne... weke kewekî dixwîne û li bendî nêçira xwe ye.

60

MAL: 6

Li pêşîya vê mala Cefto maleke din heye. Maleke nexşîn e... na!

Mala

şeytên e... na, ew jî nine!... rawestin ez ji serî de kat bikim û êdî hûn  
bi xwe

navekî li vê malê bikin. Ji ber ko li ser vê yekê şênîyên gundê me jî li  
hev

ne kirine.

Xwedê yek e, lê ev mala ha bi sê kesan e. Jin û mêrekî gundî. Ji bilî  
keçeke salbuhurî û ji çavekî xwe kwîr zarokên wan tune. Lê dîsa jî  
şênîyên

gundê me naxwazin an jî newêrin bi vê malê re têkevin têkiliyên  
germ.

— Maleke bêyom e, dibêjin û xwe ji vê malê didin hev. Êdî  
baweriyeke  
wusa li gundiyên me çêbûye ko silav û serlêdaneke li vê malê,  
pevçûn e,  
mirin e. Ji ber vê baweriya xwe heta ko ji şêniyên gundê me tê, ew  
ji xêr  
û şerê vê malê direvin û:  
— Ko ne ji bo wan cejnerojên pîrozwer be kesek naçe mala Fistûj,  
dibêjin.  
Sedemê vê tirs û vê baweriyê çîrokek dirêj e. Rasterast bi qasî jiya  
vê  
yekçava keça mala Fistûj dirêj e. Li gor ko tê gotinê, di wan deman  
de ji-  
na Fistûj bi vê keça xwe nexweş bûye. Rojekê li hênikayiya eywana  
mala  
xwe, li ser sekûkê di xew de bûye. Fistûj jî li hêla der li hewşê xerîkî  
karekî  
bûye. A di wê gavê de giriyê zarokekî sawa ji aliyê hundur ketiye  
guhê  
Fistûj. Bi kêfa ko ew ê bibe bav, Fistûj beziyaye ber sekûka eywanê,  
bi  
dilpekî destê xwe li çîpên jina xwe pelandiye, lê tişteki sawa ne  
dîtiye. A  
wê çaxê Fistûj têngêhîştiye ko zaroka wan di zikê diya xwe de  
giriya.  
Şêniyên gundê me bi vê yekê bawer ne kirine û gotine: Ev tişteki  
seyr û  
dûrî aqilan e!

Lê dû re rastî bûyereke seyrtir hatine. Piştî demekê ji mala Fistûj re ev

keçika bûye. Rojekê jineke cîran çûye mala Fistûj ko şûjinekê deyn bike.

Jina Fistûj rabûye qul ne maye li şûjina malê geriyaye lê ne dîtiye. Bi hêrs

û gotin nalet li çavên Şeytên haniye û dû re vegeriyaye ser jinika cîran û:

»— Ez şûjinê nabînim.« gotiye. A di wê gavê de vê keça mala Fistûj di

pêçekiya xwe ya çelrojî de:

»— Şûjin li ber çavika kewara garis e.« gotiye. Paşîngê nêhirîne ko bi

61

rastî jî şûjin li wir bûye.

Ku di wê gavê de vê jinika cîran jî ev gotinên pêçeka mala Fistûj ne bi-

hîsta, gundiyên me ê dîsa bawer nekirana. Lê ji wê rojê û vir de dibêjin:

»Ev mala ha aliyekî xwe î tarî û veşartî heye, bêyom e, çifta vê malê li

merivan dikeve, li gundê me dikeve.« Li gor gotinên gundiyên me, ne

carek û ne dudu, her mal û her bereke gundê me di nav xwe de li ser vê

yekê sekinîne, li ser ketine ramanên têvel û bi hev şêwirîne, dû re gelek

caran bi baldarî ceribandine ko ev baweriya wan rast derketiye...  
rast der-

ketiye ko mala Fistûj nîşaneke bêyomiyê ye.

Di van ceribandinan de cara herî xirab jî li ber mizgefta gund bûye.  
Şênîyên gundê me li ber mizgeftê gihîştine hev ko vatiniya xwe ya  
olî bi

cî bînin. Li vir çend xortên mereqdar dîtine ko Fistûj î gundiye me jî  
ber

bi mala Xwedê tê. Xortan peyva xwe yek kirine ko bêyomiya Fistûj  
û

mala wî bipîvin. Fistûj hatiye û weke şênîyên mayî ew jî li bendî  
wexta

limêja îniyê sekinîye. Xwedê dizane bê çima, lê di vê navberê de ji  
van

xortên mereqdar yek keniyaye û ji bo ko kenê wî bala kesekî  
nekişîne, li

saeta xwe nêhiriye û di ber xwe de gotiye:

— Ev bimbareka wextê jî ewqas dereng ket!

Ji şeytanî re ev dengê ha li guhê gundiye me î sofî Kurmî ketiye, bi  
enirîn li xwediyê deng mêze kiriye û gotiye:

— Tiştê ko me ne bihîsti bû jî me bihîst. Ev çi firqûzî ye, gidî!... Qaşo  
misilman e, ho!...

Xort î xwediyê saetê bi pişirîn li sofî Kurmî nêhirîye û gotiye:

— Ne misilman im, lê ez çi me, sofî Kurmî?

Sofî Kurmî destê xwe ber bi xort hejandiye û gotiye:

— Tu qeşmer î û ne tişteki din!... Divê meriv suxre neke! Limêja  
îniyê

divê di wexta xwe de bibe!...

Qeşmer li ber van gotinan danexwariye û gotiye:

— Ê erê baş e... tu limêja xwe di wexta xwe de bike, sofî Kurmî!...

ma

kê xwe daye pêşiya te û wextê, malxirab!...

Sofî Kurmî hêrs bûye, rabûye ser xwe û gotiye:

— Malxirab tu û heft sed bavê xwe ne, qeşmer!

Dengê sofî Kurmî bilind bûye û hemû misilmanên li ber vî deriyê mala Xwedê jî ketine navîna wan. Lê sofî Kurmî û wî Qeşmerî her xwe

rakişandine hev û peyvên xirab ji hev re gotine. Dû re pevçûn feretir bûye, ji herdu seriyên alîgir derketine rastê û kevir li hev rakirine.

Pîştî

ko çend xêrxwazan xwe havêtine bextê wan û li ber geriyane, ev nax-

62

oşiya ha jî rabûye.

Dû re... dû re jî şênîyên gundê me li ser vê pevçûnê peyivîne, şêwirîne

û mêze kirine ko êdî nabe. Di dawîya dawîn de rabûne rasterast ji

Fistûj

re gotine:

— Heyran, ji bona Xwedê, ji bona silametiya gundê me nekeve nava civatên gund, aliyekî te î cinî û şeytanî heye ko te bi xwe jî hay jê nîne.

Ji wê rojê û pêve hemû gundiyên me li dijî mala Fistûj gotinên xwe yek

kirine û bi yek zimanî dipeyivin. Ne tenê mêr, jinên gundê me jî rika  
xwe  
li jin û keça malê girêdane û:  
— Çavên wan xirab in, dibêjin.  
Dema ko keç û jina Fistûj î gundiye me di kuçên gund de dimeşin,  
jin  
û bûkên gundê me zarokên xwe didine kêleka xwe û ji van çavên  
xirab  
disitirînin. Lê dîsa jî mala Fistûj van gotinên gundiyan li xwe nagirin,  
bêhna xwe teng nakin û xewên şevan li xwe naherimînin. Tenê  
şevêkê...  
ji şevan şevtariyeke buhara navîn e. Mîna ko zinarên mezin di ser  
banên  
xaniyên gund de gindor bibin, şîrqîn û gurmîna birûskan e û ji  
asimanan  
serjêrî xwarê dibin. Di her carên weha de şênîyên ko vê şevê payî  
ne,  
dibînin bê çawa xanî dihejin. Ji van şênîyên ko di vê şevê de payî ne,  
jê  
yek jî ev Fistûj î gundiye me ye. Di nava nivînan de çavên wî li  
pencera  
xênî ye. Carina ew awurên wî di pencerê re ber bi asimanan bilind  
û di  
ewrên reştarî de wenda dibin. Û ji nişka ve bi qasî hezar û yek  
werîsekî  
tîrêjeke xurt ji wan bilindiyên asimanan dadikeve xwarê. Çavên herî  
saxlem jî li ber van tîrêjan reş dibin û lîlik pê dikevin. Fistûj î gundiye  
me



bi gunehweşîn radibe, lampê vêdixe, tev lampê ber bi axoyê malê  
diçe ko

hespê xwe alif bike.

Bi vekirina deriyê axo re li ser pişta hespê xwe î tazî siwarekî sipî  
dibîne.

Siwarekî bê dest û bê serî mîna telpekî ewrê sipî ye. Tirsek li Fistûj  
çêdibe,

bi mitûmatî çavên xwe dikute ko têbigêhîje ka ew kî û çî ye li ser  
pişta

hespê wî. Ronahiya lampa di dest de siyekê ji hespê wî çêdike û li  
dîwarê

hember raber dide. Li gel ko siya hespê li dîwêr mezintir jî xuya dike,  
lê

siya wî siwarê sipî tune. Pêşiyê di dilê xwe de: »Ev ruhekî asimanî  
ye,

lewra siya ruhên asimanî tune.« dibêje, dû re tavi lê dikeve  
dudiliyeke din

û dîsa xwe bi xwe dibê: »Çavên min êdî pîr bûne û ev tenê li ber  
çavên

min wusa xuyaye.« Lê li vir mîna ko ji gewriyeke zengalî derkeve,  
dengekî

nîvçe û bi xîzexîz li guhên wî dikeve. »Ma tu ji vê dunyayê têr ne  
bûyî?«

Mîna ko heta nuha pirseke weha ji xwe ne kiri be, tirseke bêyom  
digire

ser laşê Fistûj î gundiye me. Dev û lêvên wî hişk dibin, dixwaze bi  
gavekê

zûtir ji tirsaxwe, ji bêdengiya axo û ji wî siwarê sipê bi şûn  
de  
bireve. Dema ko xwe digêhîne ser nivînên xwe birûskeke tava îşevîn  
dîsa  
vedide, hundurê odê rohnê dibe û di vê navberê de ruyê Pîrosa jina  
xwe jî  
dibîne. Hêdîka li kêleka wê rûdine, destê xwe li tengala wê dipelîne  
û bi  
dengekî tevlihev dibê:  
— Ra... Pîr... ca rabe Pîros...  
Pîrosa pîrejin radibe, bi çavên serxew Fistûj î mêrê xwe û lampa di  
destê  
wî de dibîne. Her cara ko birûsk vedide û hundurê odê bi rengê  
zîvîn  
rohnê dike, Pîrosa pîrejin baştir dibîne bê serçavê mêrê wê çiqasî  
zuwa û  
tirsaxwe. Piştî ko Fistûj ji wê re çêlî axo û wî siwarê sipê dike, nîvtirs  
û  
nîvmereqî li Pîrosa pîrejin jî çêdibe. Ji bo ko tirsaxwe di dilên xwe de  
siviktir  
bikin, diçin hêla eywanê Sosina keça xwe jî ji xew şiyar dikin ko bi  
hev re  
biçine axo. Hersê endamê vê malê bi tirs û mereq ber bi axo diçin.  
Deriyê  
axo hîn jî vekirî ye. Hesp li ciyê xwe î berê ye, lê ne tiştê seyr û ne  
jî si-

warekî sipî. Nêzîkî hespê nabin. Ji dûr ve li ber deriyê axo Fistûj ji Sosina

keça xwe û Pîrosa jina xwe re qal dike, lampa di destê xwe de di ser serê

xwe re bilind dike û bi destê din jî nîgara wî siwarê sipî dike. Lê ew tiştê

ko wî dîti bû û dixwest bibêje, anuha bûye weke derewekê û li wir tune.

Fistûj î gundiyê me piştî wê şevê du rojên din jî li ser lingan digere. Gundî û cîranên ko bêdil rastî wî tî, ew vê bûyera ha ji wan re jî bi lêv

dike. Lê kesek guhê xwe nade wî. Roja sisiyan Fistûj î gundiyê me biryara

xwe dide, ji nişka ve dikeve nivînan û mirinê dipê. Ev bûyera wî di kuçên

gund de deng dide û li gel bêyomiya vê malê jî, pêşiyê derûcîran û dû re

jî şênîyên gundê me li paş serê wî dicivin ser hev û dibên:

— Rabe ser xwe Fistûj, mirin ji te dûr e!

Lê mîna ko ji xwe re kiri be rik û bixwaze rojekê zûtir ji vê dunyayê bar

bike:

— Na, dibêje, mirina min ne dûr e. Erê dereke min nayêşe û ez ne nexweş im jî... lê ez mirina xwe dibînim. Dibînim ko weke tirêjeke rengîn carina tê serlêdana min, xwe berdide nava laşê min û wê çaxê jî

sivik û sivik dibim.

Bi vî awayî pencera oda Fistûj î gundiyê me du caran tarî û du caran

rohnî dibe. Şênîyên gund bi wî de dikevin û dibên:

— Rabe ser xwe, li ber Xwedê asê nebe!

Lê ev gotinên gundiyan nikane wî ji nava nivînan rake. Tenê di demên

limêj û xwarina xwe de radibe, banî Xwedê dike, dixwe, vedixwe û dîsa

dikeve wan nivînên xwe. Mîna ko bibêjin, ev ne yê mirinê ye, piştî sê ro-

64

jan şênîyên gund li paş serê Fistûj kêr dibin û ji bilî jin û keça wî kesek li

ber serê wî namîne. Lê beriya ko tariya şeva çaran li Fistûj î gundiye me

rohnî bibe, jin û keça wî têdigêhîjin û dibînin ko rewşa wî ne baş e.

Dibînin bê çawa lêhêfa ser xwe hildavêje, diqîre û li cin û şeytanan hêrs

dibe. Yekçava Sosina keça wî dilezîne û hewarê digêhîne cîranan. Cîranên

herî nêzîk tenê xwe digêhînin ser û dibînin. Ew jî dibînin bê çawa li şeytên

hêrs dibe û dibêje:

— Doqoyê kwîr!... bihêle ez bi rihetî bimirim! Xwe ji ser riya mirina min bide alî!...

Dû re vedigere ser kevnejina xwe û jê re dibê:

— Va ez ê biçim, Pîros, min hêvî heye ko tu jî zû bidî pey min.

Sibê dema ko şênîyên gundê me mirina Fistûj dibîhisin, li ber dikevin

û ditirsin. Di nav xwe de dipeyivin û xwe bi xwe dibêjin: »Mirineke  
we-  
ha bêsedem û bêwext!« Piştî ko Fistûj dikine erdê û vedigerin, li gor  
berbora gundê me tîn sê roj û sê şevan li mala Fistûj î rihmetî  
radibin û  
rûdinin. Çay li ser çayê germ dibe, bêjengek titûn tê kişandin. Di  
rabûn  
û rûniştina xwe de çêlî başî û rindiyên Fistûj dikin. Mîna ko newêrin  
li  
paş yekî mirî bipeyivin, ji şênîyên gund kesek nebaşîyên Fistûj bi lêv  
nake, nabêjin ko merivekî bêyom bû û xwe jê dûrdixistin. Di vê  
rabûn û  
rûniştinê de çêlî kêfxweşiya xwe jî nakin. Lê dîsa jî di kuçan de gelek  
şênîyên gundê me vê mirina Fistûj bi kêfxweşî ji hev re kat dikin. Kat  
dikin ko herweha ji bêyomiyekê pak bûne, ji sosirmetekê filitîne.  
Piştî van sê rojên sersaxiya li mala Fistûj, Pîrosa jina wî tîne wan  
nivînên Fistûj dîsa li dewsa berê radixe û vê carê jî ew dikeve nava  
wan. Ji  
malên gund jin û bûkên ko hîn xerîkî alîkariya şîna mala wan e,  
pêşiyê  
dibêjin qeyê ji hatûçûya mêvanên sersaxiyê westiyaye. Lê dû re  
têdigêhîjin ko Pîros xanim jî li ser wesîyetnama mêrê xwe ketiye  
nivînan  
û ew jî çêlî mirina xwe dike. Vê carê jî jin û bûkên gund li paş serê  
wê xwe  
davêjine bextê wê û dibêjin:  
— Wusa neke, Pîros! Fistûj î rihmetî jî bi henekan mirin hanî ber  
derê

xwe. We bi henekan mirin kişand ber derê xwe... Şerm e, gidî!  
Lê Pîros xanima jina Fistûj î rihmetî ne ji van gotinan şerm dike û ne  
jî

ji van gotinan ditirse. Ew weke xwe dike û dibêje:

— Hûn çî dibêjin, bibêjin... lê wexta mirina min jî hatiye... şikir ji  
Xwedê re, min jî têra xwe li vê dunyayê xwe kevin kir.

Bi van gotinên xwe re bi çavekî şil li keça xwe dinêre, dibê:

— Lê heyfa min bi Sosina keça min tê... kê m e... heta vî salî jî kesekî  
ew

65

ne xwestiye... ji vir û weha bixwazin jî ew ê têkeve ber destan...  
berdestî

çetin e... hêviya min ji Rebbê alemê heye ko ew jî bide pey me û  
nekeve

ber destan!...

Li vir jinên gundiyan me dibînin bê Sosina yekçav û sîsale çawa xwe  
davêje ser nivînan diya xwe, digirî û dibê:

— Bi destê min bigire û min jî bi xwe re bibe, dayê! Min bi tenê  
nehêle,  
dayê!...

Şênîyan ko dû re bi vê bûyerê, bi van gotinan dihesin, dîsa hinek  
dikenin, hinek jî ditirsin û di navîna xwe de dibêjin:

— Fistûj î mêrê wê jî bi vî awayî keti bû nivînan û çêlî mirinê dikir.

Ne

dûrî aqilan e ko ev jinika ha jî bide pey wî.

Gotinên gundiyan me rast derdikevin. Heyşteke di ser Pîrosa pîrejin  
re

derbas nabe, mirina wê jî di nava gund de deng dide. Li ser vê yekê şêniyên gundê me êdî bi tevgerên vê malê nakenin. Tirsek dadikve ser

gundê me û weke siyeke bêyom di nava şêniyan de digere. Piştî ko cen-

dekê Pîrosa pîrejin jî li goristanê, di ber gorna mêrê wê de tê veşartin,

jinên gundê me wan nivînan ji mala Fistûj radikin û dibin di mizgefta gundê me de datînin. Wusa dikin ko Sosina keça malê jî nekeve wan nivînan. Lê hîn di roja pêşîn de Sosina yekçav li quncikekî mala bavê xwe

tiştêkî li xwe dipêçe û ranabe. Nan û av di gewriya wê de naçe û dibê:

— Nan û ava ko li vê dunyayê di gewriya min de çû, têra min dike.

Ev bûyera dramîk di kuçên gund de li hev digere, di demeke kurt de di

derî û rojînan re dikeve hundurê malên gundê me û di devê şêniyên gundê me de dibe benîşt. Dîtinên seyda û feqiyên gundê me dibin du beş

û dikevin pêsîrên hev. Gelek şirove derdikevin. Hinek dibêjin:

— Ev mala ha maleke şeytanî ye. Ev gotinên ha Şeytan bi wan dide got-

inê. Gotin û tevgerên weha gunehkarî ye, asêbûn e... asêbûna li ber Xwedê ye.

Hinek jî dibêjin:

— Na, ev mala ha maleke asimanî ye ko Xwedê daye gundê me, gotin

û tevgerên weha nexşîn in, merivên ko bi mirina xwe dizanin, ne  
merivên

pûç û vala ne.

Lê şirovên gundiyên me çi dibin, bila bibin, mirin carekê ketiye vê  
malê, hêlîn girêdaye û êdî zû bi zû dernakeve. Heta ko Sosina yekçav  
jî ji

vê malê, ji vî gundî û ji vê dunyayê bar dike, mirin ji vê malê  
dernakeve.

Di navbera bîst û yek rojan de sê gornên bi xweliyên nû li berwarê  
goris-

tana gundê me di ber hev de, bi destên şêniyên gundê me têne  
kolandin.

66

Îro li ser mirinên endamên vê malê baweriyên gundiyên me bûne  
du

beş.

Li gor baweriyên beşa yekem: ne tenê li gundê me, dibe ko li  
dunyayê

jî êdî maleke weha seyr û şeytanî peyda nebe.

Lê beşa din jî di wê baweriyê de ye ku: ev mala ha, maleke nexşîn  
e,

maleke pîrozwer e. Di roja îroyîn de xulfek jî di ber kêlên van hersê  
gor-

nan de kirine xwarê, paç û potik pê ve girêdane, şilkî û şîvên miriyên  
xwe

jî li ser gornên vê malê li zarokan belav dikin.

67



MAL: 7

Bi qasî sed gavan ji vê malê û ber bi jêr, li ber coya kaniya gundê me mala serbilindekî gundê me heye. Ev serbilindiya ha ji ber karmendiya lawê wî ye. Lê beriya ko meriv çêlê vê serbilindiyê bikin, divê meriv bibêjin ko di van salên dawîn de êdî gundê me jî bi dunya û alemê dide zanîn ko merivên xwenda û karmend ji şêniyên vir jî derdikevin. Tev herduyên îsalîn ev dibe mamostê şeşan ko ji gundê me derdikevin. Karmendekî postexana bajêr jî ji gundê me ye. Ji aliyê leşgerê de jî ji gundê me merivên girîng derketine. Du efser. Efserekî hewayî û yekî deryayî. Lê mixabin piştî ko kesên girîng ji nav şêniyên gundê me derdikevin êdî meriv wan nabînin. Weke berûya ko ji îşkêna xwe bikeve û dû re li vê îşkêna xwe xwedê dernekeve, ev girîngên gundê me jî li gund venagerin û qîma xwe bi şêniyên gundê me nayinin. Li bajêr silavê li şêniyan nakin. Tenê efserê deryayî carina tê gund. Ji ber vê yekê ji gundiyên me hinek dibêjin di ser vî ciwamêrê de nayê şikandin û hinek jî li hember derdikevin û dibêjin:  
— Na!... û serê wî jî tê şikandin!

Belê, ev gotina ha di şerekî ava coya pîvazan de ji devê gundiyeke me

hate gotinê. Li ser dora ava pîvazan gundiyeke me û ev mala bavê efserê

deryayî bi hev ketin. Efserê deryayî bi kincên hukumatê ve beziya axpîna

pîvazan û ew jî beşdarî şer bû. Xuya bû gundiyeke me ji kincên hukumatê

çavtirsîyayî bû û pêşiyê li ber geriya û gotê:

— Qaşo tu efserê deryayî ye, ma tu ji kincên xwe yê fermayî jî şerm nakî!

Lê efserê deryayî bi tevgereke bêşerm bi gundî da zanînê ko ew ê çavê

wî derxîne. Jina gundiyeke me di hewara mêrê xwe de hat û bi dengêkî cîr-

cîrokî di ser efserê deryayî de kire qêrîn:

— Merivê ko bi kincên hukumatê dakeve kadînan, ji pevçûna ava pî-

vazan jî şerm nake! De qeyê anuha dê û bavê wî jî kêfa xwe tînin û dibêjin: me law heye!

Ji wê rojê û vir de ye ko ew bûyera efserê me î deryayî û kadîne, di na-

68

va şênîyên gundê me de bi deng û rengêkî çîrokane tê gotinê. Lê dîsa jî

serbilindiya bavê efserê me î deryayî nayê pîvanê.

69

MAL: 8

Li hêla jêrîn, li perê rohilatî gundê me maleke rengîn heye. Maleke rengîn, lê ji bo ko çewt neyê famkirin, divê were gotin ko ne mal, en-

damên vê malê bi xwe rengîn in. Serqisê: Sermiyanê malê merivekî li dor

salên çel û çaran e, bi bejn û baleke lihev û xwediyê riyekî sor e. Şênîyên

gundê me bi navê Rîsor banî wî dikin.

Rîsor î gundiye me bavê şeş zarokan e. Lê ew bi xwe wusa nabêje. Li gor

gotina wî, ew bavê şeş parsûyên xwar e. Lewra ev her şeş zarokên wî jî keç

in. Dibêjin ko di her çêbûna zarokeke xwe de li ber Xwedê geriyaye, limêj

û silawtên zêde kiriye ko Xwedê lawekî bide wî. Lê wusa xuyaye ko ne

dengê wî çûye Xwedê û ne jî limêj û silawatên zêde pere kiriye. Di her

bûyîna zarokê de keçeke xweşik jê re çêbûye. Di her carên weha de jî

destê xwe di riyê xwe î sor re daye, asê bûye û gotiye:

— Xwedê bi min re ketiye qayişê!...

Heta nuha jî bi daxwazeke weha sal li wî buhurîne û hemû keçên wî jî

mezin bûne. Keça mezin dibe bîst, dibe bîst û çar û yê mayî jî li pey wê

bilind dibin. (ku kêmasiyeke xwe tune bin, keçên gundê me heta salên weha bilind li mala bavê xwe nahewin.) hemû jî ji hev xweşiktir in. Bejnên wan dirêj, porên wan sor û çavên wan bi rengê kespikî ne. Li gel vê xweşikiya xwe jî bavê xwe bi tenê nahêlin û di her warî de jê re dibin alîkar. Pirî caran karên mêran jî dikin, lê dîsa jî di dilê bavê wan de ew ciyê lawan nagirin. Gelek caran xwazgînî li mala Rîsor dibine mêvan û keçên wî dixwazin. Lê mîna ko Rîsor î gundiyê me li ser vê yekê di roja rojîn de biryara xwe dabe. Biryara xwe dabe ko ew van keçên xwe nede mêr û hertim jî dibêje, na. Ev tevgera Rîsor î gundiyê me tirsekê dixê dilên keçên wî. Di şevbuhurkên malê de keçik dikevîne galgalên dildariyê, çêlî zewac daxwaza dilên xwe dikin, dildarên xwe ji hev re bi lêv dikin. Dema baş têdigêhîjin ko bavên wan ji ya xwe danakeve, xwe davêjin bextê diya xwe, bi wê dişêwirin û alîkariya dêyeke diltenik dixwazin. Dayika diltenik di ber rewşa van keçên xwe de dişewite, bi şev û roj dide ber hev dide ser hev,

70

bi Rîsor î bavên wan re dipeyive, lê carekê jî dilê wî nerm nabe û hertim

dibê:

— Ez keçên xwe dernaxim!

Hêviya keçikan namîne. Bi hev re dûrûdirêj dipeyivin û peyva xwe yek

dikin. Ji rojan rojeke buhara pêşîn keça mezin ji pincarê venagere malê.

Rîsor î gundiyê me diqahire, hêrs dibe, di ser keçên mayî de dike birebir

û hêrsa xwe li wan dide der. Jina wî li ber digere û pê dide zanîn ko ew

dilê xwe fere bike, tiştêkî weha ne tiştêkî dûrî aqilan e, keçik berzewac

bûye, xwestiye bibe jin. Lê Rîsor î gundiyê me li jina xwe jî hêrs dibe û

dibê:

— Ma min ne digot?... min ji te re ne digot ko gotina... gotina ko dibê:

jin parsûya xwar, rûreşiya dê û bavan e... rasterast ji bona mala me hatiye

gotin!..

Rîsor dide ser şopa keça xwe ko bizani be ka daye pey kê. Heta ko ciyê

keça xwe ya mezin bi cî dike, keçeke wî ya din jî ji malê dûrdikeve. Ev

tevgera keça wî ya duyemîn ji hêrs û tetirxaniyê bêtir, şermeke mezin li

Rîsor çêdike. Şênîyên gund têne mala wî, navbîniyê dîkin ko dozê safî

bikin. Lê Rîsor î gundiye me xwe nade ber vê yekê û dibê:

— Ez dozê safî nakim û êdî nadim pey wan jî... Şeytan bi wan re be! Piştî çend rojan Şeytan dikeve destên du keçên wî yên din û bi hev re ji

ber çavan wenda dibin. Vê carê cot bi cot diçin. Rîsor î gundiye me êdî

nola berê hêrs nabe, tenê ji ber van tevgerên keçên xwe şerm dike, der-

nakeve nav gundiyan. Dev ji limêjên îniyan jî berdide. Di mal de diqirçile, difikire û carina xwe bi xwe dike pilepil û dibêje:

— Bi kêmanî divê ez van herdu keçên xwe yên mayî bizewucînim... ez

ê bi def û bilûreke mezin derxînim... Wusa bikim ko vê rûreşiya mala xwe

bi vî awayî pak bikim.

Lê Rîsor î gundiye me pêre nagêhîne. Mîna ko ev herdu keçên piçûk jî

ji xwengên xwe yên mezin hêz û şîret girti bin, di navîna heyşteki de ew

jî wenda dibin.

Piştî çuyîna van hemû keçên xwe, carina difikire ko dade darê tivingê û

bi pey bênamûsên mêrên keçên xwe bikeve. Lê dû re biryara xwe dide û

xwe bi xwe dibê: »Jin ne ew tişt e ko meriv ji bo wan mêrên bênamûs jî

bikujin.« Mîna ko êdî Rîsor î gundiye me hînî vê yekê bibe tew xwe nalivîne. Dernakeve der, heta ko jê tê xwe ji şêniyên gundê me jî dûrdixe.

Çêlî keçên xwe nake. Tenê tiştêkî dike. Dema ko di oda mala xwe de bi

tenê dimîne, bi hêrs riyê xwe dikişîne û serê xwe li dîwaran dixîne.

71

MAL: 9

Ko meriv di ber vê malê re ber bi jêr bi qasî çar werîsên din jî bimeşin, li

perê derveyî gund, (şêniyên gundê me dibêjin: ji xêra Xwedê re li perê

derveyî gund e.) li ser piyê çepê, ji du textên sikincê ew ê deriyekî reşotankî bi ber çavên meriv bikeve. Ev derî, deriyê mala Gendo ye.

Bi

vekirina vî deriyî re bêhneke seyr, bêhneke laboratuarî ê li firnikên pozê

meriv venişe. Bi gotineke din, bêhna tirşî, meşkên helisî, postên xwêkirî,

bêhna mûyê kizirî, bêhna qoç û hestiyên şewitî, bêhna hûr û serûpê... Ca

bifikirin ev hemû bêhnên ha li nav hev bikeve, ew ê bêhneke çawa jê

derkeve!

Şêniyên gundê me bi vê bêhnê dizanin. Dizanin ko weke viya bêhneke

din jî li ruyê dunyayê peyda nabe. Serqisê, ko meriv ser û çavên  
gundiyeke  
me bi şareke reş bipêçe, girêde, li hespeke siwar bike, bigerîne,  
bigerîne,  
bigerîne û dû re bîne li hewşa mala Gendo dawestîne, ew ê tavilê  
têderxe  
ko li hewşa mala kê ye.  
Li eywana vê malê, di nava vê bêhnê de hertim beroşeke mezin li  
ser  
argûn e û bi tiştê dikedê. Û bêguman hertim jî hespeke darîn di  
destê  
Tûsika jina Gendo de ye û vê beroşê tev dide.  
Ku xwarina di hundurê beroşê de li gor dilê Şepal î kûçikê wan be,  
ew  
ê jî were xwe li kêleka argûn bavêje erdê, herdu lingên xwe yên  
pêşîn ber  
bi pêş ramedîne, serê xwe bide ser û bipê. Dema ko hesk di beroşê  
de  
dibe, guhên vî kûçikê jî bel dibin, serê xwe radike, pozê xwe ber bi  
heskê  
tûjikê dike û dixwaze beriya Tûsikê ew biçêje. A di wê gavê de heska  
di  
destê Tûsika jina Gendo de bilind dibe û li serê vî kûçikê dikedê.  
Şepalê  
reben bi tevgereke tawanbar dîsa serê xwe datîne ser lingên xwe  
yên pêşîn  
û dipê. Mîna ko li zarokekê çilek hêrs bibe, Tûsika jina Gendo jî di  
ber



xwe de di ser Şepal de digine, divine:

— Pîrato, pîrato!... te hesk heripald!... pa tu likalî hilekî sepir bikî!...  
dibêje û bi wê heskê dîsa xwarina di beroşê de tev dide.

Ji şênîyên gundê me dema ko yek ji şêla jin, keç an jî bûka xwe ne  
razî

be, dibêjin:

72

— Şêla te weke şêla pozxetimiya Tûsika jina Gendo ye!

Sal duwanzdeh mehên Xwedê pozê Tûsikê tijî ye, xetimandî ye. Di  
peyivîna xwe de tîpa m û n li devereke pozê wê asê dibe, tîpa m  
weke

dengê tîpa p û tîpa n jî weke dengê tîpa l derdikeve.

73

MAL: 10

Di nava zikê gund de li paş mizgefta mala Xwedê, mala malmezînê  
gundê

me heye. Lê ne nuha... malmezîniya vê malê rengdêreke demên  
kevin e

êdî. Di demên kevin de şênîyên gundê me qedir û rûmeteke mezin  
nîşanê vê malê dane. Xwediyê erd, rez, pez û şivan bûye.

Gotin hatiye ser gotinê, divê meriv viya jî bidine zanîn ko di nava  
şênîyên gundê me de baweriyeke wusa heye ko dibêjin: li gundê  
me

merivekî baqil di dawîya dawîn de dîn dibe, merivekî ji Xwedê re  
piştî de-

mekê dixerife û li hemberî Xwedê asê dibe, merivekî dewlemend  
xizan

dikeve...

Rastî û çewtiya vê baweriyê bila di gundê me de bimîne, lê ev  
malmeziniya mala malmezinê gundê me jî piştî demekê wenda  
bûye.

Zarokên ko ji vê malê rabûne, di roja îroyîn de her yek bi xwî û  
aqilekî

ne. Belengaz, şerpeze, xizan ketine. Ji bilî vê rengdêra pûç û vala  
tiştêkî

xwe tunene. Bi vê êş û diwariyê diqepijin... êş û diwariya  
malmeziniyê.

Ji vê rengdêrê şerm dikin. Ko ji destê wan were, çi piçûk çi mezin  
hemû

jî ew ê bixwazin di roj û danekî de ji vê rengdêra kambax pak bibin.

Lê ji

destê wan nayê, rengdêra malmeziniyê li wan bûye gûyekî hişk û zû  
bi zû

jê pak nabin.

Şêniyên gundê me nefspiçûkiya xwe didomînin û hîn jî vê malê bi  
navê

malmeziniyê bi lêv dikin. Dema ko mêvanekî Xwedê an jî şevderekî  
çolan li gundê me dihewe, pêşiyê rêya mala malmezinê gund  
dipirsin. Li

gundê me tew jî ne şerm e ko meriv ji maleke malmezinan daxwaza  
xwarin û vexwarinekê bikin. Ji ber vê yekê pirî caran şêniyên gundê  
me jî

bêşerm daxwaza vê yekê dikin.

Di her demên weha de, bi gotineke din dema ko mêvanek li vê malê di hewe, di wê gavê dest û lingên malmezînekê gundê me li hev digere, di şîne nav malan weke hêk, arvan, rûn û pincarê dide deynkirin ko bi ser-

bilindiya malmezînekê mêvanê xwe bi rê bike.

Lê piştî ko bi serbilindî mêvanên xwe bi rê dike, a wê çaxê hûn rewşa malmezînekê mîrê malê bibînin! Hûn bibînin bê çi dike! Ma çi nake ku!...

74

bêhna wî teng dibe, birûyên wî dikeve nava çavan, mêşeke bi dîwêr ve

dike sedem ko bi jina xwe ve pevçîne, li zarokên xwe hêrs dibe.

Lê şênîyên gundê me bi vê bêhtengîya wî dizanin. Bi taybetî jî dema

ko birûyên wî dikevî nava çavên wî, wê çaxê şênîyên gundê me dizanin

ko tiştêkî çawa qewumîye. Di dest de têdigêhîjin ko wê rojê an jî wê şevê

mêvanekê gundê me hatiye û çûye.

Ca bifikirin ku!... piştî malmezîniya demekê meriv biçe ber deriyê şivan

an jî destirmanekê mala bavê xwe û jê têreke garis, an jî meşkek dew bixwaze!... Ji bo zarokên malmezînekê êşeke gelekî giran e ko ew şivan an

jî destirmanê ha jî jê re bibêje:

— Baş e, mîrê min, ez dikanim bidim lê... lê tu ê bikanî bî kengî li min

vegerînî?

Xwedê bi wan re be!... Lê ev rewşa malmazinê gundê me di nava şêniyên gundê me de bi gelek babetan şirove dibe. Hinek dibêjin,

Xwedê

çiyê dibîne û berfê lê dibarîne. Hinek dibêjin, ji ber nifirên xêrnexwazên

şêniyên gundê me ye. Hinek jî dibêjin, ji kêmaqiliya wan e.

75

MAL: 11

Li jêra vê malê jî, mala destirmanekî mala malmezinê gundê me heye. Lê

ev jî ne nuha, weke ko hat gotin, ew demek bû û buhurî. Merivekî şêrîn,

şorgerm, nefspiçûk e. Rewşa wî ya îro ne weke berê xirab e, bi gotineke

din, di roja îroyîn de di nava malên gundê me de dewlemendekî destê

duduyan e. Lê wek ko dibêjin, xwiyê şîrî heta pîrî ye. Ew jî hîn ji

tunebûnê ditirse, carina bêyî daxwaza xwe dikeve rewşeke çikosiyê û bi vê

tevgera xwe, di nava malên gundê me de weke çilkeke reş e.

Gerçî çikosiya hemû malên gundê me jî heye, lê dîsa jî... dîsa jî dema ko qereçî têne gundê me, hemû malên gundê me jî van qereçiyên di-

hewînî û wan xwedî dikin. An jî parsekek li deriyekî malên gundê me

bixin, bêguman bi destên vala venagere.

Lê ev mala ha ne wusa ye. Dema ko qereçî têne vê malê, zarokên  
vê  
malê dikin ko ew tişteki ji qereçiyên bigirên. Di şevên îniyan de şîva  
miriyên dernaxînin, dema ko jina gavanê me diçe şîva gavanan, ew  
dibêjin, du kufte zêde ne û yek jî hindik e. Her weha kuftekê bi du  
ciyan  
dikin û yek û nîvê didine mala gavanê gundê me.

76

MAL: 12

Li taxa jêra gundê me maleke din... şênîyên gundê me dibêjin, Mala  
Medikê û Xwedê dizane di nava malên gundê me de ev mala ha  
tenê bi  
navê jina malê bi lêv dibe. Ne ko di vê malê de mêr tune ye, na. Mêr  
jî  
heye.  
Bi navê Rîço mêrekî bi bejneke jar û dirêj, bi pozekî piçûk î sorikî  
heye.  
Dema ko dipeyive jî dengê zirav, dengê mîna dengê jineke  
sermagirtî  
ji poz û gewriya wî derdikeve. Ji ber vî dengê xwe pirî caran şerm  
dike û  
di civatên şênîyên gundê me de napeyive. Gundiyên me, bi taybetî  
jî  
mêrên gundê me:  
— Rîço î gundiye me bêdeng e, dibêjin.  
Lê ne wusa ye. Ko meriv rojekê guhê xwe li peyivîna wî û jinekê  
ragire,

meriv ê bibêje ko zimandirêjtirîn jineke dunyayê jî li ber vî Rîço î  
gundiyê  
me solan rast dike. Meriv ê tiştêkî din jî bibêje... meriv ê bibêje ko  
Xwedê  
di kar û hunera xwe de tenê li ser çêkirina Rîço î gundiyê me poşman  
bûye, pêşiyê xwestiyê jinekê ava bike, dû re di gava dawîn de jî  
poşman  
bûye û hinek tiştên mêranyê lê reşandiye. Bi gotineke din, simbêl  
û ew  
hemû pirça ko Xwedê weke nîşana mêranyê bi meriv ve  
dizeliqîne... Ko  
ne ji wê jî be, tiştêkî wî û mêranyê (li gel zewaceke heft salan jî Rîço  
î  
gundiyê me bi zarokêkî şa ne bûye.) bi hev nakeve.  
Peyivîneke jinane, xwiyekî jinane, ken û henekên jinane, dil û  
tevgereke jinane... mafê xwendevanan heye ko bibêje: ma ev hemû  
tiştên  
jinane çawa ne? Serqisê, em ji kar dest pê bikin. Rîço diçe sergînan.  
Bi  
lêyan dikeve rêxê û tar û tepikan çêdike. Piştîyan hildigire. Diçe  
pincarê.  
Diçe bîr û kaniyê û bi du satilan avê dikêşîne. Di riya avê de mîna  
jinên  
mereqdar li ber her jinekê disekine û bi wan re dipeyive. Di peyivîne  
de  
weke jinan destên xwe di binçengê xwe de li hev siwar dike. Bi  
dengekî

zirav dikene û bi kenê xwe re destekî xwe dide ber devê xwe. Ko mijara

ken an jî gotinê hinekî seyr be, (li gor Rîço î gundiyê me hertişt seyr e.)

wê çaxê birûyê xwe ber bi jor hildikute, bi dengekî zirav dibêje:

— Hewûûû!... tiştê ko me ne dîti bû jî me dît!

77

Ev hevoka jorîn li Rîço î gundiyê me bûye xwî, jê re bûye şiyar û wext bêwext bi kar tîne. Bi taybetî jî dema ko bi jinên gundê me re dikeve gale-

galê. Ko jineke gundê me pê bide zanîn ko mazî derketine, a wê çaxê ew

ê birûyê xwe ber bi jor bike û vê şiyara xwe bibêje. Ev şiyara wî di hinek

şêniyên me jî geriyaye.

Ji dêla ve ko şêniyên gundê me navê serjinik li Rîço î gundiyê me bikin,

mala wî bi navê jina wî dinavînin û dibêjin: Mala Medikê.

78

MAL: 13

Li pêşberî vê mala Medikê, maleke din heye. Mîna ko ne ji mala Xwedê

û ne jî ji mala Şeytên be. Maleke bi rengên seyr e. Şikebar e. Ne tenê ji

şêniyên gundê me re, xwe bi xwe jî wusa ne.

Sermiyana vê malê jinebiyeke ji malmezinan e. Lê ji kê dibe bila bibe,  
ji mala Xwedê be jî, jin, di gundê me de tenê jin e û ne tiştêkî din e!...  
gotina ko dibêje: Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e, li gundê me cî jê re tuneye. Bi  
gotineke din li gundê me: şêr şêr e, jin jin e û mêr jî mêr e.  
Ku em vegerin ser sermiyana malê, diya yanzdeh zikan e. Her zikek tiştêk jê derketiye, rengêk jê derketiye. Ko em bi zarekî din bibêjin, rengên oldar, rengên nerind, rengên firqûz û qeşmer derketine...  
belê  
belê... rasterast qeşmer derketine... Ko ne wusa be, ma meriv di ser limêjê  
de... serqisê, diya wan li ser limêjê ye, berê xwe daye kevirê reş û xwe li ber  
xwar dike... a wê çaxê ev qeşmerê ha ji paş ve fîstanê diya xwe bilind dike,  
hejekî dide binê wî fîstanê diya xwe... ev diya malmezîna êdî ne xwar û ne  
jî rast dibe.  
Ji ber nexş û rengdêrên endamên vê malê, şênîyên gundê me vê malê bi  
navê Mala Kulîlkê dinavînin. Di ferhenga şênîyên gundê me de gotina  
Mala Kulîlkê gelek maneyên xwe hene.  
Serqisê, meriv dikane têbigêhîje ko ev mala ha maleke jihevketî ye,  
ji



endamên malê ne bawerî û ne jî haya yekî ji yê din heye, her endamekî

malê seriyekî dikişîne û her yek jî bi regekî ne...

79

MAL: 14

Li taxa jorîn, li rohilatî oda gundê me, bi qasî çend werîsan ji vê odê dûr,

di binê dibistanê de maleke kevin lê bi rengdêreke nû heye. Dema ko

meriv li ser vê rengdêra nû bihizirin, meriv ê bibêje qeyê ew hemû guhert-

inên ko di dawiya sedsala bîstan de li dunyayê çêbûne, tenê ji bo vê malê

bûne. An jî bandora xwe tenê li vê malê kiriye û loma navê berberiyê li vê

malê bûye. Şênîyên gundê me dibêjin, ji bo ko xwediyê malê di xwestina

peran de şerm neke, wî ev navê berberiyê li mala xwe kiriye. Ma diket bîra

kê ko ji gundê me jî berberiya bi peran derkeve! Heta pênc sal berê jî

kesên ko karê şe û meqesê ji destên wan dihat, li ber siya dar û dîwaran

çog didan erdê, weke vatiniya gundiyekekî hêja bê serêş û bê pere serê

gundiyekekî me çêdikirin. Tew carina gundiyekekî me î ko îro navê berberiyê li

xwe kiriye, li mala xwe jî serê şênîyên gundê me çêdikir. Dema ko  
meriv  
diçûn mala wî, bi hurmet û berborên berê xêrhatinê li merivan dikir,  
çay  
keremî merivan dikir, por û riyê merivan dihat çêkirin û tew qala  
peran  
jî ne dibû. Lê wek ko min got, xuyaye guhertinên ko di dunyayê de  
bûne  
di gundê me jî geriyaye.  
80

MAL: 15

Li jora taxa jorîn weke gelek avahiyên gundê me xaniyekî din î li ser  
du  
qatan heye. Ji xwe ji vî xaniyî û ber bi jor jî êdî xanî tunene. Dibistana  
gund heye.  
Ev xaniyê ha mala parêzgerê gundê me ye. Heta anuha jî ez bi xwe  
nizanim bê ev gundiye me çi diparêze û xwediye çi vatiniye ye. Tiştê  
ko  
ez dizanim di rojên îniyan de piştî ko seyda derdikeve ser banê  
mizgeftê,  
bang dike û dadikeve, a wê çaxê ev parêzgerê gundiye me jî bi  
pêlikên  
mizgeftê ve hildikişe jor, li ser banê mizgeftê, ew ciyê ko bi qasekî  
berê  
seyda lê sekinî bû û bang dikir, li wir ev gundiye me î parêzger dest  
pê  
dike:

— Kî golikên xwe bêxwedî berdin nav ziyanan, kî hespên xwe bêxwedî

berdin mêrgan, ez di...

Bi dengêkî gelekî bilind diqîre, çî çêr û gotinên ko nayêne gotinê parêzgerê gundê me dibêje... dê, jin, xweng çî tê ber devê wî dibêje.

MAL: 16

Li kujekî bakurê gundê me maleke... na ev ne mal e... ne mal e, ne kon e,

ne şikeft e... ecêbeke giran e... endamên wê ne ji ademiyan e, ne ji asi-

maniyan e û ne jî ji cin û pîrebokan e... doxînê di tengala pişta xwe de

dişidînin, zikê xwe piçûk dikin... ji bo ko birçî nebin, gûyê xwe nakin...

81

82

Li vî gundî, li nav van malan û bi van şêniyan re ev dibe payîza çaran ko

li malbata mamoste Kevanot dibuhure, ji bo ko bi her awayî ji gundiyan

re bibe alîkar, kêmasiyên wan rast bike, bi gotin, bi peyv û bi tevgerên

xwe ji wan re bibe nimûnegîn, di van sê salan de çî ji destê mamoste Kevanot tê, ew dike.

Di sê salan de ew guherînên ko natur dikane di daran de, di hespan de,

di merivan de bike, bêguman anuha di endamên mala mamoste  
Kevanot

de jî kiriye, serqisê: xwiye zaroktiye ji ser Nêrgisa koçer radibe, ruyê  
wê î

gilover li xwe diqelibe û bûkek xweşiktir jê derdikeve, bejnûbala wê  
tije

dibe û dirûvên jineke gîştî pê dikeve, bi kenê xwe, bi henekê xwe,  
bi şorg-

ermiya xwe, bi tinaz û zimandirêjiya xwe... bi her awayî xwiye jinên  
vî

gundî digire, ko ji xweşikiya wê ya koçerî jî nebe, meriv têdernaîne  
ko

jina mamosteyekî ye.

Tenê bêyomiyek, bêyomiyeke ko pirî caran di serê jinan de tê... Ko  
meriv wê jî nebêje, di van sê salan de jiyana zewacê û mayîna li vî  
gundî

weke dermanekî devê birînê li Nêrgisa koçer hatiye, lê wek ko tê  
gotin,

jiyan serê xwe bixwe!... carina gul e, carina jî dirik e, heta heft meh  
beriya

nuha jî zarok jê re çênabe, ev yeka ha ji bo mamoste Kevanot  
kêmasî û ji

bo wê jî rûşiyek e, lê li dawiya her tengasiyekê fereyiyek heye,  
dibêjin,

bi rê û şîret, bi gotin û alîkariya jinên gund, Nêrgisa koçer di rojên  
pîrozwer de şilkiyan çêdike, li ser goristana Mekanê Mala Dînan li  
zarokên pêxwas û bêkes belav dike, xwe li ser vê goristanê dirêj  
dike, destê

xwe vedigire û banî hemû ruhên pîrozwer dike, banî wan dike ko ev  
êşa

rûreşiyê ji ser rabe û îro, anuha »Şikir ji Xwedê re!« dibêje û xwediyê  
zikekî heftmehî ye.

Guherînên ko naturê di van sê salan de li vî gundî li mamoste  
Kevanot

kiriye dewlementir, piralîtir û nexşîntir e, serqisê: xwiyekî seyr lê  
peyda

dibe û li kuderê dibe bila bibe dema ko çûçikek bi ber çavên wî  
dikeve

tavilê hustuyê wî dizivire û li pey dinêre, dema ko di ber an jî binê  
darekê

re derbas dibe bêyî daxwaza wî serê wî ber bi jor bilind dibe û çavên  
wî li

ser pel û giliyan digere, mîna yekî ko êdî ji vî gundî be jiyana gund  
pê

xweş tê, kevnetexsiya ko çê xirab pêwendiyên wî û bajêr çêdikir  
piştî de-

83

mekê ew wê jî difiroşe û destê xwe jê dişo, ew du sê nasên ko li  
bajêr

hebûn ew wan jî zû ji bîra dike, çûyîna xwe ya bajêr pêşiyê kê m û  
dû re jî

pir û pir kê m dike, pirî caran ji bo pêwîstiyên dibistanê jî di xwe de  
nabîne ko biçe bajêr, ji çend îniyan carekê kaxizekê reş dike, dide  
dest

muxtêr an jî gundiyekî jîrtir û pêwîstiyên dibistanê bi vî awayî  
berteref  
dike, dema lingên wî bi bajêr jî dikeve mîna ko rêveçûna di kuçên  
bajêr  
de ji bîr kiri be weke gundiyan kûvî hertim li paş û pêşiya xwe  
dinêre, û  
ne tenê ev, di kirîna tiştan de weke gundiyan dikeve heftûheyştê û  
bazariyê dike, ko lingên wî bi çayxanekê bikeve bi firefira qumên  
çaya  
xwe xelkên li dora xwe nerihet dike, piştî demekê baş pê ewle dibe  
ko ew  
lezeta ko li gund digire û pê kêfxweş dibe li bajêr tune, loma  
çûyîna sî-  
name an jî tiyatroyekê tew jî nakeve bîra wî, pirî caran kuçên bajêr  
lê teng  
dibe û mîna ko bifetise bêhna wî li ciyên weha nayê der, gelek caran  
piştî  
çûyîna xwe ya bajêr nola masiyê ko ava wî were guhertin gêjikî dibe.  
Di van sê salan de bi navê dersa Tarim Bilgisiyê pêşiyê hêleke hewşa  
dibistanê bi xwendekaran dide kolandin, bîstanê firingî û îsotan lê  
diçine, li kujekî vê hewşê bi gundiyan axoyekî dide lêkirin, li rasta  
hewşê  
jî pûneke fere... weke hemû gundiyan mamoste Kevanot jî êdî dibe  
xwediyê du serî mange, nogin û parone, pênc mî û bi qasî şêst serî  
mirîşik, Xwedê dizane ko gelek şênîyên vî gundî jî ewqas heywan  
tunene,  
dema ko ji bo ardûyê salê çiyayê gund tê parkirinê, mala mamoste

Kevanot jî weke maleke gund xwediyê parekê ye, lewra ew jî êdî  
weke  
gundiyekî vî gundî ye, tenê di rojên îniyan de riyê xwe î sor kur dike,  
mî-  
na ko ne ji bona Xwedê lê tenê ji bona xatirê gundiyan di van rojên  
pîrozwer de derbasî mala Xwedê dibe û weke hemû gundiyan ew jî  
xwe  
rast û xwar dike, nola gundiyan mêşên fetisî ji dîzikên dewên tirs  
dide alî  
û bi heskên nîvşewitî vedixwe, bi gundiyan re dipeyive, dikene, bi  
wan re  
dilîze, pirî caran bi wan re pevdiçine û dîsa bi wan re li hev tê,  
beşdarî ser-  
emoniya miriyan û xwestina keçan dibe, nola hinek şênîyên gund  
ew jî  
çûyîna xwe ya oda gund kêr dike û têkiliyên li nav malan diçêtirîne,  
weke hemû gundiyan ew jî di gund de ji xwe re xêrxwaz û  
xêrnexwazan  
çêdike, ji gundiyekî bêtir dizane ko çend berê gund hene, kîjan mal  
ji kî-  
jan berê ye, her malek çend kes in, çi kes bi çi xwiya ye... hemûyî jî  
baş  
dizane. Lê dîsa jî hinek aliyên wusa veşartî û wusa nixumandî li ba  
van  
gundiyan hene ko ne gengaz e mamoste Kevanot pê bizani be û  
dibe ko  
ev gundiyan ha bi xwe jî hay ji van aliyên xwe yên sergirtî tune bin.  
Rojên

mamoste Kevanot bi vê rewşê û bi vî awayî li vî gundî dibuhure.

84

Ber bi êvarê beriya ko mamoste Kevanot zarokan ji dersxanê berde,  
weke

hertim deftereke piçûk ji bêrîka paş pantolê xwe derdixe, lê dinêre  
û dibê:

— Îro doba... Gurgê û Bodê ye ko dersxanê paqij bikin. Demo û Mîro  
mange û golikan dixine axo... û girêdidin. Dilşa û Zoro jî qût davêjine  
mirîşkan û dikine pûna wan...

Piştî van gotinên xwe, weke femandarekî ko leşgerên hêja hilbijêre  
mamoste Kevanot jî di ser serê hamû zarokan re banî Mem û Beşîr  
dike,

bi dizî, bi pistepist ji wan re jî tiştina kat dike û mîna ko dest bi  
jiyaneke

nû bike, bi kêfxweşî li zarokan vedigere:

— Baş e, dibêje, anuha derkevin û bêdeng biçin.

Ji bilî Gurgê û Bodê hemû zarok bêdeng ji dibistanê belav dibin,  
Demo

û Mîro berê xwe didine pêşiya naxirê, Mem û Beşîr berê xwe didin  
Newala Cinan û ji gund derdikevin, Zoro û Dilşa jî berê xwe didine  
malê

ko biçin qûtê mirîşkan bînin, herweha navên ko hatin xwendin weke  
leşgeran her yek ber bi vatiniyekê dibezin û piştî demên weha  
vatiniya

mamoste Kevanot jî ev e ko dakeve hewşa dibistanê, biçe nav  
bîstanê xwe

û bifîkîne.



Nêrgisa koçer ji lojmanê derdikeve, ber bi bîstên tê, herdu destên  
xwe  
dide binê zikê xwe, bi delalî, delaliya ko ew ê bibe dê bi mêrê xwe  
dide  
zanîn ko ew ê heta mala Xanê biçê, mamoste Kevanot jî bi nepixîna  
bavekî, bi rewşeke bextiyar li zikê jina xwe dinêre:  
— Baş e, ji xwe ez ê jî dû re biçim mala Şero, dibêje û di nava bîstên  
de  
bi ger fîkandina xwe didomîne.  
Dilşa xwe digêhîne malê û diçe ber kewarê, kewara wan bilind e, çi  
dike  
nake nikane xwe bigêhîne jora kewarê ko hinek garis jê derxîne, bi  
ra-  
manê zarokekê difikire ko girîşê devê çavika kewarê bikişîne û bi vi  
awayî  
garis derxîne, wusa jî dike, lê çer ko paç ji devê çavikê dikişîne garis  
ji ke-  
warê diherike, bi destê xwe î piçûk du sê caran wî girîşê dîsa  
didewusîne  
ciyê berê lê bi ser nakeve, nikane devê çevikê bixetimîne, heta ko  
bi qasî  
du têran garis li ber çavika kewarê diherike ser hev Dilşa bi çavekî  
tirson-  
ek û ruhekî gunehkar lê dinêre, bi tepîna dengên ligan re li paş xwe  
dizivire û li deriyê derve dinêre, bi gupîna dilê wê î piçûk re diya wê  
85

dikeve hundur, çer ko dayika wê çav li garisê ber devê çavika  
kewarê

dikeve bêyê ko deng bike satilên avê ji destên xwe datîne, bi hêrs  
xwe

digêhîne vê gunehkara piçûk, bi porçika serê wê digire, ne dibê yek  
û ne

dudu... bi dilekî pêt lêdixe û di ber re jî bi hêrs dibê:

— Ev çi karê te ye! Ev çi xax e, xaxcirîn! Dîsa çerçî hatiye, ne wusa!

Tu

careke din jî gûyê wusa belav dikî, an ne!... Tu Dilşa î, bi dilê xwe şa  
ne

bî!

Qîreqîra keçika reben e, di nav lepên diya xwe de digirî, hewar dike  
û

dibê:

— Dako heyran, dako! Dayê ez bi gorî, dayê! Ez careke din... ax  
dako!

Ez carek din tişteki wusa nakim, dako! Dako, serê min dêşe! Dako  
welle... ax! Doba min e, loma dako, dako!...

Diya serhişk û dilhişk bi gavekî lêdana xwe sist dike û di nava giriyeke  
êşdar de dibihîze ko keçik çêlî dobekê dike, loma dest ji lêdanê  
berdide,

lê dîsa jî bi hêrs dibêje:

— Doba çi, dêlik!..

Porçika dêlikê di nava lepên diya wê de bûye weke hola benderê,  
bi

çavên xwe yên şil û bêguneh hinekî jî bi tirs li ber lingên diya xwe  
dinêre

û dibê:

— Doba min û qûtê mirîşkên mamoste ye, dako...

Bi bihîstina vê hevokê re mîna ko bibêje ev destên min bişikên,  
destê

diya wê di ber de tîn, poşmaniyekê digire ser dilê wê î hişk û dibê:

— Ma çima tu ji diya xwe re nabêjî, keça min? Tu çima nabêjî doba  
min e û mistek garis bide min? De zû rabe ser xwe û bibe!..

Dilşa bi dilê xwe î teng û hîskikên girî radibe ser xwe, pêşa xwe ber  
bi

diya xwe vedigire, piştî ko diya wê sê kulmist garis dixê pêşa wê, bi  
pêşa

xwe digire, ji hundur derdikeve û bi lez berê xwe dide hewşa  
dibistanê.

86

Destekî Nêrgisa koçer li ser zikê wê û yê din di ber de li ba dibe,  
dadikeve

nava gund, li nêzîkî ber deriyê hewşa mala Xanê bêhna gêrmîyeke  
meyîrîn xwe li pozê wê dide der, di ser piyê hewşê re Xanê çav li wê  
dikeve, ji rasta hewşa mezin ji ber beroşa gêrmîyê bi pişirîn ber bi  
derê

hewşê diçe û dibê:

— Erê ca were Nêrgis, were...

— Erê metê, ez jî ji xwe dihatim ba te.

Bi ken, bi pişirîn, bi henekên hûr û bêdeng Xanê û Nêrgisa koçer  
têne

rasta vê hewşa mezin, mîna ko tiştêk di dilê Xanê de hebe û nikane  
bi lêv

bike ji ber beroşa gêrmîyê zûzûka hildikişe jor û bi nan, bi pîvaz, bi kevçî

û bi namkî dîsa vedigere jêr, dadide heskê, beroşê tev dide, namkiya di

destê xwe de tije gêrmî dike, li ber beroşê datîne:

— Erê... bila hinekî sar bibe û bixwe bi qurban!... dibêje û bi kenekî hûr

didomîne: Erê di bîra min de bû, welle... Bi vî Mekanê Mala Dînan, min

digot, anuha Nêrgisa min li vir bûya û hinek ji vê gêrmîyê bixwara... Mala min şewitî!...

Nêrgisa koçer li rasta vê hewşa mezin li ber beroşa gêrmîyê rûdine, Xanê jî bi xwiyê xwe î hertimî her bi ken e, bi pişirîn e, bi gotin e, ji niş-

ka ve dîsa hîkehîkeke hûr û bêmane pê digire û bi vî kenê xwe re dibêje:

— Erê mala min şewitî, bi Xwedê nuha tu newîranan jî dikî!... bila zarokek were ez ê anuha bişînim nav rezên jorîn.

Nêrgisa koçer destê xwe dide ser milê Xanê, ditepîne û:

— Na bi serê min û te, metê, pêwîst nake... dibêje, berê xwe dide siya

dîwarê hember, ji peyva newîranîyê şerm dike, serê xwe dixwe ber xwe û bi

dengê nizim didomîne: Erê hinekî hêdî bipeyive, metê... Bi Xwedê nuha xalê Sayîb jî bihîst û...

Xanê li siya dîwarê hember dizivire û bi pişirîn:

— Dev ji wî berde, ew bi desmêja xwe de ketiye û guhên wî jî giran e,

dibêje, bi dilovanî li Nêrgisa koçer dinêre û didomîne: Bi Xwedê anuha

tu pir newîranan dikî, ma jina ko bi zarok nexweş... Erê gelek maye an?...

Bi liveke şermok Nêrgisa koçer serê xwe di ser zikê xwe î werimî de xwar dike û bi dengekî nizim:

87

— Welle nizanim ko... ez dibêm qeyê hîn du meh û tişteki maye, dibê-

je, kevçiyek gêrmî dikişîne devê xwe, ji nişka ve xwe serast dike û mîna ko

tişteki bi dizî bibêje, didomîne: erê, metê te qala newîranîyê kir... ma tu

nizanî bê şeva çûyî çî hat serê min rebena Xwedê!...

Xanêya ko hertim devliken e, li hemberî van gotinên Nêrgisa koçer dudilî dibe, kofiya xwe hinekî bi paş de dide, hustuyê xwe ber bi wê dirêj

dike û bi dengekî nizim dibêje:

— Çima, çî bû?

— Hewûûû... metê, ez dibêm qeyê ez ê li darê dunyayê tu carî wê bûy-

era şeva çûyî ji bîr nekim.

Li ser van gotinên Nêrgisa koçer, pêşiyê matmayîneke piçûk li Xanê di-

yar dibe, dû re tavi lê kenekî bêsedem pê digire û di nav kenê xwe re bi

dengêki nizimtir dibê:

— Erê ca bibêje, miqûfê! Çi xax hatin serê te? Şeytan bi te keniya, çi bû?

Hîk, hîk, hîk... de bêbêje, bibê!...

Nêrgisa koçer du sê caran xweziya xwe di devê xwe de berhev dike, dadiqultîne, di bin çavan re li Sayibê xerîkî destmêjê dinêre û bi rewşeke

tevlihev, bi pistepist:

— Ez çi bibêjim, metê, dibêje û dest pê dike: Şeva berê... nîvê şevê bû.

Ji nişka ve tîrek li min rabû. Min xwe li vê hêlê qeliband ne bû, min xwe

zivirand ser aliyê din dîsa ne bû. Min çi kir ne kir tewatîyê cî ne dida min

ko ez çavên xwe bidime hev. Vê qolincê xwe di tengela min de bada û xew

ne ket çavên min. Ez rabûm di nava cilan de di paş piştta mamoste de

rûniştim. Bi qasekî ez weha rûniştî mam, lê vê bêxwediya tîrê ez bernedam. Tiştê ko min dizanî bû, dermanê êş û azarê jî li malê tune bû.

Ez hinekî fikirîm û min kir ko ez mamoste ji xew şiyar bikim. Lê dû re

xwe bi xwe min got, ma ez ê çima banî wî bikim. Paşîngê rabe û ji bo xe-

wa xwe jî li min hêrs bibe, vêca ew ji min kê m e!... Herweha bi demekê

ez di êş û azara xwe de qepijîm. Dû re ji nişka ve goristan û ev Mekanê

Mala Dînan (destê xwe ber bi goristanê bilind dike.) kete bîra min.

Di

dilê xwe de min got, welle ez ê jî derkevim der û berê xwe bidim vî Mekanî. Min lampe vênexist, min ne xwest ez mamoste şiyar bikim.

Bêyî

ko zêde bifikirim, ez rabûm di tariya odê de bi alîkariya destan ber bi dêrî

çûm. Min vekir û derbasî eywanê bûm. Ji wir jî min derî vekir, bi lingên

xwasî û bertena şevkirasê xwe derketim pêş derî. Di vê tariya nîvê şevê de

bayekî hênik li sîngê min xist, min herdu destên xwe dan binê vî zikê xwe

û min çavên xwe girt. Xwişîna pelên sipîndarên li kêleka dibistanê û  
88

şireşira ava newala kaniyê li nav hev diket, dengêkî mîna dengê bûm an jî

kundên darên goristanê di nav re dihat û li kerika guhê min diket.

Min

di dilê xwe de lava kir û got: »Xwedêyo! Ev çi êş û qolinc e di vê şeva nîvê

şevê de li min rabûye. Ez bi qurbana te, Mekanê Mala Dînan!... Tu î ko

ji rêwiyên çolan re bûye rêber û te ew gihandine war û malên wan! Tu î

ko ji kesên cinî re bûye hêvî û te dev û çav li wan rast kiriye! Te î ko xwe

ji keç û xortên dildar re ne daye paş û te mirazê wan bi cî hanîye!  
Te î ko  
guhdariya tepîna dilên dayikên bendewar kiriye û bûyî berkela ber  
dilê  
wan!... anuha ez ne gelekî, tenê bi qasî çar werîsan ji te dûr im.  
Weke wan  
kesên belengaz û reben, ez jî xwe davêjim bextê te û dibêjim...«  
Nêrgisa koçer li vir vedigere ser Xanê mîna ko bixwaze bala wê  
bikêşe  
ser tiştêkî veşartî, dibêje:  
— Ez çî ruyê xwe ji te reş bikim, metê. Bi navê Xwedê, çer ko ez ji te  
re  
dibêjim, wusa metê. Min dikir ko ez bibêjim: »Vê êş û azarê, vê tîr  
û  
qolincê ji tengala min derxîne, ji giyanê min dûrxîne!« Êş, qolinc... li  
xwe  
varqilîm û min nêhirî ko ne êş û ne azar e. Herwha jî ew peyvên min  
û  
ew tiştên ko min ê bigota, di dev û dilê min de man û min ne got.  
Lê de-  
ma ko ez baş bi xwe ewle bûm ko tîra serdilê min derbas bûye, wê  
çaxê  
pêlên bawerî û hêviyeke wusa li min rabûn ko bêpîvan! Pêjneke  
xweşkewîn girte ser ruhê min û bi min wusa hat ko di navîna min û  
Xwedê de tenê du buhust mane û nêzîktir jî... Di dilê xwe de min  
digot:  
»Ku îşev ez daxwaza çî bikim, bixwazim bi kuderê de biçim bêguman  
ew



ê bi cî were.« Ez çî rûreşîyan bikim, metê... Ya rastî daxwaza ko pêşiyê hat ser hişê min jî ev bû ko min digot ez ê lava bikim da ko Xwedê destê xwe dirêjî min bike û min bibe ba xwe. Bi vê daxwaza xwe re min êdî çavên xwe vekir. Lê bi vekirina çavan re ew tariya darên goristanê li ber min tarîtir, tarîtir û tarîtir bû. Ji nişka ve giyanê min lerizî û tirsek li min rabû. Tirseke bênav û bêmane, tirseke wusa ko ew sê gavên eywanê li min bûn riya sê salan. Bi dijwarî min berê xwe da eywanê û min xwe havête hundur. Ez nizanim bê min çawa derî li pey xwe girt. Bi destlepki min xwe gihande ser nivînan. Di paş piştî mamoste de min lihêf di ser serê xwe de qeliband. Di binê lihêfê de jî tewatîyê ez ne girtim. Ez diricifîm, dilerizîm... haa wusa! Ez bi xwe jî nizanim bê ji çî bû. Lê her ko ez diricifîm, ramanên xirab di serê min de vedijend û xeyalên seyr dihatin ber çavên min. Bi wê tirs û leriza xwe jî hîn ez difikirîm ko meriv li ber Mekanê Mala Dînan dest vegirta, daxwaza tiştan bikira û bigota: »Filankesê, an jî bêvankeso ji gornê rake.« gelo ev daxwaza ê bibûya? Car bi car ev tirs û

pirsên weha di serê min de li hev diketin û di pey van asûwasan re  
 min  
 bala xwe didayê ko kevir û kêlên gornên goristanê ji cî dileqiyên û  
 di nav  
 re serê miriyan dixuyan. Dema ko wan miriyan serê xwe yên bi  
 pirçûpo-  
 la kufikî dihejandin, kevir û bersal bi du ciya dibûn, ew jî ji nav  
 derdiketin û ji girê goristanê dadiketin. Perçên goştê helisî ji ruyê  
 wan diqertilîn û ji jor de dihatin xwarê. Bi dijwarî li ser lûlên hestiyê  
 çîpên xwe  
 ber bi deriyê me dimeşîyan. Ez vegeyriyam ser xwe û min dîsa di dilê  
 xwe  
 de got: »Tiştên wusa nefikire û neyine bîra xwe!« Min ne dihanî bîra  
 xwe,  
 lê dîsa jî ev aferîdên pîrozwer ji ber çavên min wenda ne dibûn.  
 »Xwedêyo!... Ev çi bû di serê min de hat!« min got û ez lerizîm. Ez  
 nizan-  
 im bê vê bobelata ha çiqasî hajot, lê hêdî hêdî xewê digirte ser min  
 û di  
 dawiya dawîn de ez ketim rewşeke xewxilmajiyê. Di vê  
 xewxilmajiya xwe  
 de min du sê caran dengê bihîst. Min bihîst lê... dema ko meriv  
 serxew  
 be, ewqas bala merivan nakişîne. An jî guhê meriv deng zêde ji hev  
 der-

naxîne. Lê piştî ko ew denga du sê carên din jî li pey hev bilind bû,  
ew ler-  
izîna bi qasekî berê weke tayê dîsa bi min girt. Gumaneke wusa li  
min  
çêbû ko min digot vê carê ew miriyên pîrozwer deng jî dikin. Ez êdî  
payî  
bûm, xweş payî bûm û guhê min jî êdî bi awayekî pir zelal deng ji  
hev  
derdixist.  
»Nêrgis, Nêrgis, Nêrgis!« Bang dikir û her carê jî ji sê caran zêdetir  
an jî  
kêmtir ne digot. Xwe bi xwe min got: »Ew miriyên bi qasekî berê ji  
girê  
goristanê rabûn û daketin, anuha jî li ber dêrê banî min dikin.« Min  
lihê-  
fa xwe ya bi tirs li serê xwe piçikand, çavên xwe bi hev de şidand û  
di dilê  
xwe de min got: »Xwedê!... nebe ko ev di derî re an jî di pencerê re  
têkevîne hundur!« Guhê min li ser dengê qirçîna derî û pencerê bû.  
Min  
digot ew ê anuha bişikînin û têkevîne hundur. Lê dengê ko min  
dibîhîst,  
ji devekî bû. Ango hertim yekî bang dikir. Ji bilî wî dengî, teperepa  
lin-  
gan an jî dengekî din tune bû. Gelek ne buhurî ew denga dîsa bilind  
bû:  
»Nêrgis, Nêrgis, Nêrgis!« Mamostê ko li kêleka min çiqasî ji min  
nêzîk

bû, ewqas jî ji min dûr bû. Min hêle di xwe de ne didît ko ez bangî wî jî

bikim. Xwedê dizane ev di jiyana min de cara yekem bû ko min pêwîstiya

alîkariya mêr û mêraniyê dixwest. Min êdî dixwest ko mamoste rabe...

rabe hewara min. Lê mîna ko giraniya deh miriyan li ser min be, ne deng

ji min derdiket û ne jî destê min dilivîya ko ez dirêjî piyê wî bikim û bibêjim: Rabe!... Û dîsa ew denga:

»Nêrgis, Nêrgis, Nêrgis!« Xwedêyo!... çî şeveke xirab bû!... bi awakî wusa dikûriya ko te digot qeyê hirçekî birîndar e. Carina nîvçe, carina

90

zêde û carina jî mîna kalekî bêdidan... bi gewriyeke xîzexîz gazî dikir. Hêleke lihêfa ser min leqiya, dilê min got, hatin; piyê min got, na ew mamoste ye. Bi vê cara sisiyan re mamoste serxew serxew şiyar bû lê ew jî

bi guhên xwe ne ewle bû. Min têderxist ko di nivînan de guhê xwe li bê-

dengiyê radigire. Ez di nava nivînan de tew li wî navê Nêrgisê xwedî derneketim. Dema ko cara çaran bangî min kir:

»Nêrgis, Nêrgis, Nêrgis!« Mamoste rabû ser xwe û di tariyê de ber bi

derî çû. Di wê tariyê de çavên min bi pîjamê wî yê belek ket. Jora sipî-

belekiya pîjamê wî di tariya odê de weke parxwanên bêgoşt xuya  
bû û ew  
jî li ber çavên min bû yekî ji wan. Lê dîsa jî min di dilê xwe de digot:  
»Mamoste ê anuha biçe ji wan re derî veke û ew ê têkevîne hundur.  
Ko  
ew li derve mamoste bibin, an jî werin hundur û min bibin... êdî ji  
bo  
min û wî hevdiştina me ya dawîn e. Ew jî di tariyê de...« Serê min hîn  
bi  
van ramanan li hev diket, dengê vebûna derê eywanê hat min. Di  
hemû  
demên zewaca min û mamoste de, heta wê gava şeva çûyî jî xwîna  
wî tew  
bi min şêrîn ne hati bû. Lê wexta ko bi qirçînî derî vekir, kizînî bi dilê  
min  
ket û ev dilê min ewqas bi wî şewitî... ewqas şewitî ku!... Ji min  
wetrê min  
ew şandi bû ser mirinê. Anuha ez viya kat dikim, metê... ez kat dikim  
lê  
ez bi xwe jî nizanim bê ez çawa rabûm ser xwe. Rabûna min,  
vêxistina  
lampê û çûyîna min ya ber derê eywanê bi carekê re bû. Tenê tiştê  
ko tê  
bîra min... min fikir ko êdî ez derketama lê di devê derî de min  
tavilê  
dengê mamoste nas kir. Li pêş min bi hêrs li tariya der kire qêrîn û:  
»— Ew kî ye?« got, lê beriya ko ji tariya derve bersivêk were di  
gaveke

pir û pir kurt de çavên min lê keti bû jî. Pêlên bayê şevê, ronahiya  
di destê  
min de weke hêlkanekê li ba dikir û ne dihişt meriv baş bibîne. Lê  
min  
dît. Yek tenê bû. Ji pêşiya derê eywanê hinekî dûr, tişteki nola  
histûneke  
sitûr di cî de bêliv rawestiya bû. Mîna ko bi betanê lihêfekî pêçayî  
be, jêr  
û jora wî sipî bû. Ji navê ber bi jor sitûrtir dixuya. Min bala xwe dayê  
ko  
li jora wî, tişteki mîna moriyê ji ronahiya lampê dibiriqî. Wek  
meriveki jî  
dixuya, lê dişibiya gelek tiştên din jî... tiştên ko min heta nuha ne  
dîtiye...  
meriv nikanî bû baş ji hev derxista ka bi rastî jî çi bû. Di dilê xwe de  
min  
got, »Ew meriv e, çavên wî...« Lê dû re fikirîm ko çima çaveki wî  
tenê  
dibiriqe. Di pey re tişteki din ket dilê min: »Ev Xocê Xizir e û di  
hewara  
min de hatiye...« Ji ber ko porê wî jî sipî mîna hirîyê bû. Ev tiştên ko  
ez  
dibêjim, di navîna du sê lêdanên dil de di serê min de çêbûn, metê.  
Dû  
re... dû re ew dengê ko bi qaseki berê bangî min dikir, vê carê bi  
dengêki  
nizimtir bersiva mamoste da û:

»— Xoce...« got. Bi navê Xwedê, metê, wek ko ji te re dibêjim... bi vê  
gotina wî re vê carê jî jana serêşekê bi min girt, min destekî xwe havêt  
porçika serê xwe û bi lez, bi gavên fere min xwe havête hundur...  
min  
xwediyê deng nas kiri bû. Ew ne ji miriyên goristanê û ne jî Xocê min  
î  
Xizir bû. Ew Siyabendê kwîr î notirvan bû. Ji nav rezan hati bû, digot:  
»— Xoce... ez dizanim ko Nêrgis bi zarok nexweş e. Min got...  
newîranan dike... ez van hermiyan jê re bibim.«  
Xanêya ko heta anuha bi tirs, bi dilpekîn, bi mitûmatî guhdariya vê  
ser-  
pêhatiya Nêrgisa koçer dike, li vir kenekî wusa pê digire ko tev  
Sayibê  
guhgeran ew hemû keç û bûkên li ser kaniya pêş mala wan jî  
dibihîsin, ji  
ken ziman lê nagere ko peyva di devê xwe de bibêje, Nêrgisa koçer  
jî her  
di bandora bûyera xwe ya şeva çûyî de, bi tirs, bi şermokî li Sayibê  
ber siya  
dîwarê hewşê dinêre û bi dengê nizam:  
— Erê metê, tu dikenî... lê bi rastî jî ez gelekî tirsiyam, dibêje û vê  
ser-  
pêhatiya xwe bi pistepist dîsa didomîne: Lê tu nizanî, metê... tu  
nizanî ko

ez wê şevê çend caran mirim û dîsa rabûm. Çend caran tirsiyam,  
dizanî?

Piştî bûyerê jî ez tirsiyame... lê vê carê tirsî min ne ji miriyên  
goristanê

bû. Gupîna dilê min bû û lêdixist ko ez ê çawa xwe ji dest û devê  
mamoste pak bikim... Mêr dilxirçik in û dikanin ji hertiştî gumanê  
bikin.

Ew ê bigota: »Siyabend yarê te ye, an ne di vê şeva nîvê şevê de  
nexweşî,

newîranî, hermî...« Di nava nivînên xwe de min xwe bi xwe digot:  
»Gelo

ez ê çiqas çû û repikan jê bixwim?« Dû re min bersiva xwe jî dida û  
dig-

ot: »Ez ê bibêjim, ma ez çî bikim? Tu bi xwe jî dizanî ko dîn e. Ma tu  
bawer dikî ko min hermî jê xwestiye, jê re gotiye were? ko tişteki  
wusa li

dora min hebe, ma kes ne ma ez ê bangî vî dîne yekçav û porsipî  
bikim!«

Ji ken Xanê di ciyê xwe de nahewe, kofiya wê dixuşike paş hustuyê  
wê,

şara dorê difilite, zik lê hişk dibe û bi mebesta ko bibêje: »ê lê dû  
re?« pey-

va »êê?...« tenê ji dêv derdikeve, Nêrgisa koçer didomîne û dibê:

— Êê... a wusa, metê. Dû re jî mamoste hêrs bûye, her hermiya ko  
wî

ji paşila xwe derxistiye û dirêjî mamoste kiriye, yek bi yek mamoste  
ew



hemû hermiyên ha ji dest girtine û bi şûn de li nav çavên wî xistine.

Piştî

bûyerê jî mamoste bi wê hêrsa xwe ya derve vegeriya hundur, deng ne kir,

ji min ne pirsî û ne got ev çi ye? Gerçî bigota jî min ê nikani bûya pê bi-

da famkirin, ji ber ko min hay ji tiştê tune bû. Ez bawer im mamoste jî

têgêhîştî bû. Loma... tenê di bin çavan re li min nêhirî, tufî serçavê min

kir, lampe temirand, bi hêrs xwe havêt ser nivînan û lihêf di ser xwe de

qeliband. Ew hemû tiştên ko wê şevê di serê min de hatin û li ber çavên

92

min geriyan, bi xewxilmajiyê destê sibê re ji ber çavên min wenda bûn

û êdî ez nizanim bê ez kengî ketim xewê, metê. Vê sibê jî dema ko em

rabûn, ne mamoste çêlî şeva buhurî kir û ne jî min tiştê pirsî. Heta xwa-

rîna taştiya jî ev bûyera şeva çûyî weke pirsekê di serê min de bû. Lê min

digot, ew tiştên ko şeva çûyî qewimîn, xewnek bû, xewneke şevên nexweşiya bi zarokan... min bawer ne dikir. Lê mîna ko deh kes ji min re

bibêje, ca biçe li derve li dewsa wî binêre. Dû re ez derketim derve  
û min

mêze kir ko ew hermiyên gîştî li erdê perçe perçe belav bûne.

Li vir Nêrgisa koçer vedigere ser Xanê û bi saxikî dibêje:

— Bi rastî ez hîn jî têngêhîjim, metê. Gelo ev dîne ha ji bo çi û bi çi  
ramanî hati bû? Hindik ma bû ko zirav li min biqetiya. Ez pir tirsiam,  
metê, pir!...

Xanê bi vê tirsî wê jî dikene û dibê:

— Erê, ma tu çima ditirsî! Xwezika mêrekî ji min re... hîk, hîk, hîk!...  
ji min re jî di paşila xwe de hermî bihaniya. Wê çaxê... wê çaxê me  
ê ji dil

hermiyên paşilên xwe bi hev biguheranda, hîk, hîk, hîk!...

Nêrgis bi vî xwîyê Xanê dizane, dizane ko pirî caran rastî û henekên  
wê

bi hev re dibin, lê mîna ko bibêje ev ne rewşeke henekan e û  
bixwaze

têbigêhîje ka bi rastî jî çi bû, êdî li hemberî kenê Xanê naxîre,  
rasterast

xemgîn e, nerihet e û ji hinek tiştan serê wê tevlihev e.

Xanê vê rewşa wê dibîne, vedigere ser û li gotinên xwe yê jorîn  
zêde

dike û dibê:

- Siyabend ne dîn e, keçê. Siyabend xwedîmal e, jina wî, law û keçên  
wî... ma tu nizanî bê kalê pêşek... naxîrek neviyên xwe hene,  
miqûfê!...

— Ez dizanim, metê... dizanim lê çima wusa kir, ez têngêhîjim.

Heta

nuha jî tiştêkî wusa nebûye... Ez dibêjim wê çaxê xerifiye.

Xanê dike ko bikene lê nakene, kenê xwe di xwe de digire, dixwaze bide

famkirinê:

— Na na, dibêje, ne dîn û ne jî xerifiye. Merivekî hinekî saxik e. Ya rastî

merivekî dilpak e. Ez dizanim nuha dîsa ji me çêtir cinên wî hatine dorê,

xew lê herimiye, nexweşiya te ketiye bîra wî û wî jî...

Nêrgisa koçer bi rewşeke mitûmat peyva wê di dêv de dibire û dibê:

— Te got çî, metê?... te got, cinên wî?..

— Erê lêê... Siyabend cinî ye. Ma ew ne dîn e ko...

Saxik, dîn, cinî, diyar e ko Nêrgisa koçer têngagêhîje, nikane ji hev derxîne, bi serekî tevlihev herdu destên xwe di ber xwe de vedigire û hêdî-

ka dibê:

93

— Uff, metê!... çî dîn û ciniyên dunyayê hene, Xwedê jî hemû li vî gundî berhev kiriye. Tu kê dipirsî, li kê dikolî...

Xanê bi pişirîn destê xwe dide ser çoga wê, vê rastgotina wê dipeyitîne

û dibê:

— Erê bi Xwedê tu rast dibêjî, Nêrgisa min. Ma li vî gundî kesekî baqil

heye!

Bi van gotinên xwe re mîna ko ji dûr ve yekî bibîne, Xanê zûzûka radibe

ser xwe, di ber xwe de hêdîka pêşa xwe dawdişîne, dest davêje  
kofiya xwe,  
ji hêlekê ve serast dike û ji hêlekê ve jî her li kuçê dinêre, Guziyê ko  
bi  
qasekî berê bi ber çavên wê dikeve dîsa xuya dibe, ji nişka ve bi  
dengekî ji  
dengê heta nuha bilindtir:  
— Ero Guzî, ca were!... Were, sitranekê bavêje ser Pero, were!...  
dibê-  
je, dikene, vedigere ser Nêrgisa koçer û didomîne: Binêre, yekî din  
jî va  
hat, tew ev yê ha dengbêj e jî.  
Saqoyekî reş î bêbetan li navpiyê wî dengbêjî, di destê wî yê çepê  
de  
çoyekî dirêj î mûsayî, bi şalwerekî boz î pînekirî û delingeke kin,  
pêxas  
ber bi hewşê diloqe, tê û bi pilepil sitranekê dibê:  
Hewar e mîrê min hewar e!  
Mala Sayîb mala mîr û mêran e!  
Pero xanim e, xatûn e, delala dilan e.  
Delala dilê birîndarê şûr û xençeran e.  
Hewar e, hewar e mîrê min hewar e!  
Di devê deriyê vê hewşa mezin de Guzî destê xwe î vala ber bi siya  
dîwêr  
vedigire, hustuyê xwe bi paş de rep dike û bi dengê xwe î taybetî  
dibê:  
— Ma ne wusa ye, keko?... Tu û Xwedê... ma ne wusa ye, Sayîb!...  
çi-

ma tu xwî dikî, keko?

Sayîbê ko destmêja xwe girtiye û li ber siya dîwarê hember, li ser qon-

cekî rûniştiye, bi bihîstina vî dengê Guzî re di ber xwe de hûr hûr dikene

û bang dike:

— Ca were, Guzî, were... were em tirampekê bikin.

Guzî di ber beroşa gêrmîyê re derbas dibe, ber bi Sayîb diloqe, bi qasî

sê gavan jê dûr li pêşberî wî radiweste, dîsa wî destê xwe î vala bi pêş de û

hustuyê xwe bi paş de rep dike û dibêje:

— Çi ye, mîrê min? Tirampa çi?...

— Tu were em tirampeyeke xêrendar bikin. Wek ko qereçî tirampên

94

ker û hespan dikin, ez û tu jî... em... em jî tirampa jinan bikin. Tu were

diya xwe bide min û Xanê jî ji xwe re bibe û hew!... hî, hî, hî!...

Ji doza namûsê re Guzî qet xwe nade paş, ji bo namûsê çi bibe dike, de-

ma ko yek qala diya wî dike pir hêrs dibe, pirî caran xelk jî çêlî diya wî

dikin ko pê wî hêrs bikin, anuha bi van gotinên Sayîb dîsa hêrs dibe, zûzûka jê vedikişe, çoyê di destê xwe de davêje erdê, destê xwe î vala di ser

Sayîb î rûniştî re bilind dike û di ser de dike birebir:

— Ez ê di quncikê zîndanê de bimîzim ha! Tu çi xwîna xwe dikî hus-tuyê min, dîkê pîr! Biçe bi destûra Xwedê bimire!... dibêje, mîna ko bi

gazin an jî bi şîret berê xwe bi Xanê de dike û didomîne: Binêre, Xanê...

li mêrê xwe xwedî derkeve, bila xwîna xwe neke hustuyê min!... Jê bipirse

ka çi dixwaze. Sayîb rakiriye, heyran!... bi Xwedê Sayîb xerifiye û hew!...

Sayîbê xerifî hûr hûr dikene, solên xwe bi ser lingên xwe ve dike, ji hewşê derdikeve kuçê, di ber xwe de dike pilepil, navê diya Guzî bi lêv

dike ko bêtir hêrs bike, Xanê ji hêlekê ve bi kenê xwe bala Nêrgisa koçer

dikişîne ser vê rewşê û ji hêlekê ve jî namkiya di destê xwe de rayê Guzî

dide û bi bergerîn dibê:

— Were, Guziyê min, were... were, tu dev ji Sayîb berde... were gêr-miyê bixwe.

Di demên hêrsbûna xwe de, çi tişt di dest Guzî de hebe, davêje erdê, bi

destvala şer dike, bingehiya taktîkê şerdariya wî ev e, di hemû şerên jiyana

xwe de ew tucarî jî vî destê xwe î vala bi kesekî nake, her di ser wan re

vedigere û bi birebir hêrsa xwe dadixîne, dû re tiştên ko havêtine erdê

hêdî hêdî berhev dike.

Anuha jî diçe wî çoyê xwe î ko bi kêrî şer ne dihat ji erdê radike, ber  
bi  
beroşa gêrmîyê diçe, namkî û kevçî ji dest Xanê digire, bêyî ko li  
dora xwe  
li kesekî binêre an jî bipeyive, gêrmîyê ji namkiyê dikişîne devê xwe,  
nan  
û pîvazên di badika kêleka ber beroşê de ji destê wî har û hewarê  
dike,  
yekî herî têr jî dema ko li vê nanxwarina Guzî temaşe bike ew ê bi  
xwe jî  
birçî bibe, ji ber pîvaza tûj hêsir ji çavên wî tê, kevçiyê gêrmîyê di  
nava  
lêvên xwe de dişidîne, mîna dengê bayekî kur fîzefîz bi firnikên wî  
dikeve,  
di gelek carên weha de dilê meriv pê dişewite û meriv dibê qeyê sê  
roj  
beriya nuha xwarina dawîn xwariye.  
Dîmenên weha, dîmenên dînan, dîn û saxikên gund heta nuha gelek  
caran li kuçan, li hewşên malên vî gundê ha rastî Nêrgisa koçer  
hatine, lê  
ne bi qasî anuha ji nêzîk ve, anuha baştir têdigêhîje ko gelek dîn û  
kê-  
maqilên vî gundê ha li malên xwe jî doza xwarinê nakin, li quncikên  
95

malên xwe rûdinin heta ko xwediye malê, bi gotineke din, heta ko  
birçîbûna wan nekeve bîra malxirabekî malê nizanin nan bidin ber  
dîn û

kêmaqilên xwe, lê ji xêra Xwedê re di her dem û her wextî de çend  
dil-  
tenikên weke Xanê hay ji vê rewşê dibin, weke vatiniyeke pîrozwer  
her  
rojên Xwedê mast û dewê xwe î zêde li hewşên xwe datînin hêlekê,  
çend  
namkî û teştêk nan didine ber, dema ko çav li rebenekî ji van  
rebenên  
gund dikevin, taviê bangî wan dikin û zikê wan têr dikin.  
Xanê û Nêrgisa koçer li kêleka Guzî rûniştine û li nanxwarina wî  
dinêrin, Xanê bi dilşewatî vedigere ser vê rewşa wî û dibê:  
— Bixwe, be qurban, bixwe! Bixwe, ez ji te re dîsa dagirim.  
Guzî bi kêfxweşî wan gotinên xwe yê bi qasekî berê ducar dike:  
— Erê, bavo!... Mala Sayîb ji berê de mala mîran e, dibêje û bi ken  
didomîne: Lê carina Sayîb jî... erê, ew jî bi xwe de dirî!... he, he, he!..  
ma  
ne wusa ye, Xanê! Tu û Xwedê... ma Sayîb ne wusa ye, Xanê?... ma  
Sayîb  
bi xwe de nake, Xanê?  
Di her peyivîna wî de hûrikên nan, avdewa gêrmîyê ji devê wî  
dipijiqe  
derûdorê, Xanê çav li Nêrgisa koçer dişikîne, berê xwe bi Guzî de  
dike û  
dibê:  
— Wusa ye, Guzî, wusa ye... lê ka te Pero çi kir, Guzî?  
— Pero ê were!... çima tu xwî dikî, Xanê!..  
— Miqûfo!... zarokên wê mestûmezîna bûne, lawo!..  
— Erê, ew ê zarokên wê jî ji min re kar bikin. Em ê jî bibîne maleke



mezin!

— Ma ka te erd û mal heye, miqûfo?

— Erê, erdê Xwedê fere ye, Xanê!

Piştî ko Guzî namkiya duduyan jî dixwe, herdu destên xwe di dev û serçavê xwe re dide, radibe ser xwe, berê xwe dide Xanê û:

— Xanê ciwanik e! Mala Sayîb, mala mîran e, heyran! Li dîkê pîr mêze

bike, Xanê! Bila bi xwe de nerî! Heyfa Sayîb e, bila bi vîjikê nekeve!... dibêje, dîsa bi wê sitrana xwe û bi zikekî têr berê xwe dide kuçê.

Xanê bi pişirîn, bi pozpilindî, bi serbilindî li kuçê, li hawurdora xwe dinêre, Nêrgisa koçer têdigêhîje ko Xanê ji vî karê xwe kêfxweş e û her

cara ko zikekî weha têr dibe, ev kêfxweşiya wê lê zêdetir dibe, bi mereq-

dariya jinekê jê dipirse û dibêje:

— Erê metê, te ji wî re çêlî Pero dikir, ew kî bû?

— Pero, dildareke wî ya wextekê bû. Keçikek xweşik bû. De îcar ev dînê ha jî di kuçên gund de digeriya û:

96

»— Ez ji Pero hez dikim, dilê min ketiye wê, ez li ser Pero dîn bûme.« digot. De qeyê rebeno berê wer baqil bû!... hîk, hîk, hîk... Lê bi rastî jî dilê

wî keti bû keçikê. Navê revandina keçikan bihîstiye... Erê lêê... Rojekê

derengî şevê diçe ber dîwarê hewşa mala bavê keçikê, li bendî disekine ko

keçik were derve û ew jî wê birevîne. Di wê gavê de, ji şeytanî re  
dinêre  
ko yek derdikeve. Ev Guziya jî rasterast derdikeve rastê û bi  
pistepist bang  
dike:  
»— Pero, ma tu nayê em bidin pey hev û biçin?« dibêje. Ew yeka  
bê-  
deng diçe hundur û bi gavekê şûn de dîsa derdikeve. Guzî wan  
gotinên  
xwe dubare dike. Ew yeka jî, di wê tariyê de bi çarşefeke reş tê, xwe  
bi  
Guzî ve dizeliqîne, destê wî digire û derdikeve kuçê. Heta newala  
paş  
malan jî xwediye çarşefê deng nake. Guzî jî bi dilpekiya revandina  
keçikê  
dilerize, diricife û carina di ber xwe de:  
»— Ma em bi kuderê de biçin, Pero?« dibêje, lê bersivekê nagire.  
Dema  
xwe digêhînin newalê, Diloyê bavê keçikê wê çarşefê ji xwe dike û  
dikeve  
ser Guzî. Ne yek û ne dudu... davêje binê guhên vî rebenî. Dengê  
wê  
qêrîn û hewara wî hîn jî di guhên min de ye. Wê şevê dengê wusa  
xirab  
ji hêla newalê dihat ko... Gelek tirsîya bû. Dû re çend gundî ber bi  
newalê  
beziyan û bi dijwarî ev rebenê ha ji nav lepên Dilo xelas kirin. Qaşo  
sey-

dayê gund bû... bi qurbana min û seydatiyê be! Bê çawa destê te lê di-

geriya, çavrijiya!... Welle piştî vê bûyerê li derekê çavê min li Dilo î bavê

keçikê ket û min peyvên nemayê jî jê re gotin. Ma li ber xwe dikeve, ner-

ind! Devê xwe jî li ber min xwar dikir û digot:

»— Ji xwe te û hinekên weke te rû dane van dînen ha! Divê meriv dî-

nan baqil bike, Xanê, baqil!« Lê wê çaxê ez pir hêrs bûm. Ez meta te me!...

welle min jî dest havête hustukura wî, du sê cara hejand û min gotê:

»— Şerm bike, seyda, şerm!... Tu qaşo seydayê gund î... Baş e, em bibêjin ew dîn, ma tu jî dîn î ko tu di şevereşê de çarşefê li xwe dikî, wî ji

gund derdixî û lêdixî!... ma tu ji Xewdê jî natirsî!... Bi navê çêyiyên Xwedê, nola şeytanekî tu ketiye nav me, şeytan!« Piştî çend rojan jî ji vir

bar kir û çû. Ji xwe ne ji vî gundî bû.

Li vir mîna ko Xanê rastiyeke bide xuyakirin, hinekî bi hêrs û di ber xwe de:

— A wusa bû... kî tê gundê me, ji me dîntir dibin, dibêje, lê tavilê vedi-

gere ser Nêrgisa koçer û li gotinên xwe yê jorîn zêde dike: Ez bi qurbana

te, koçera min... hûn jî ne ji vir in, lê min li ser we ne got. Tu bi xwe jî

dibînî ko... hîn jî dema ko ez qala wê bûyerê dikim laşê min dilerize.

Nêrgisa koçer di ber xwe de bi nîvşermî dipişire û dibê:

— Na na, metê. Ez li xwe nagirim. Lê... lê dû re çi bû?

— Tişteke jî ne bû. Bar kirin û çûn. Lê ji bo ko Guzî hêrs bikin, bikenin an jî... çi dizanim an jî pê dilê wî xweş bikin, jê re wusa dibêjin. Tew ca-

rîna bangî Guzî dîkin û jê re dibê: »Guzî, Guzî!... Pero hatiye mala bê-

fankesê!« Guzî jî wê çaxê radibe ser xwe û mîna dildarekî birîndar berê

xwe dide wê malê. Reben!...

Nêrgisa koçer bi saxikî û rengdîniya gelek tîpên vî gundî dizane, dizane

ko carina ji wan re çêlî keç û jinan jî dibe, lê têngêhîje ko merivekî dîn

çawa dikane evîndar bibe, bi vê pîrsa serê xwe re, bi mitûmatî ji Xanê

dipirse û dibê:

— Ma dildariya kesên dîn û cinî jî dibe, metê?

— Kesên din jî ne, dîn û cinî! Bi Xwedê dildariya wan xurtir û dirêjtir dajo. Li vî gundê me, ji îro jî bêtir... gelek dîn û cinî hebûn. Ewqas rengîn

bûn ko meriv ne dixwest ji ba merivan biçin. Ji wan çend kes mirin, du

sê keç jî hebûn...

Nêrgisa koçer zûzûka peyva Xanê dibire û dibê:

— Ca raweste, metê, te got keç jî?...

— Erê lêê... jê yek jî... tê bîra min em wê çaxê keç bûn, keçeke van malên Nezikan hebû. Navê wê Kewê bû. Bi rastî jî weke mêkewekê xweşik û lihevhatî bû. Di rindbûna wê de heta nuha jî min di vî gundî de keçeke wusa ne dîtîye. Porekî zer û filikî xwe ji jor de berdida ser tilorên wê. Xwediyê bejneke bilind û dagirtî bû. Hustuyê wê dirêj, çavên wê gir û nola van moriyên hespan hêşîn bûn. Weke hinareke qelişî lêvên wê ji dûr ve sor dikirin. Lê xwiyekî wê î naxoş hebû. Mîna ko bixwaze ji binê erdê tiştina bibîhise, carina çog didan erdê, pêşa xwe di ser serê xwe de diqeliband û bi saetan guhê xwe li erdê radigirt. Ji ber vê rengdîniya wê jî dê û bavê wê lê mêze ne dikirin. Têr nan ne didanê. Hertim şekalên diya xwe bi ser lingên xwe ve dikir. Jê re kinc ne dikirîn. Pirî caran rihma Xwedê lê be, diya min kincên me î kevin bi hev ve dizeliqand û li wê dikir. Piştî demekê wê dev ji vî xwiyê xwe berda. Êdî dawa xwe di ser serê xwe de ne diqeliband û guhdariya binê erdê ne dikir. Lê vê carê jî bi daran ve hildikişiya. Li ser daran devê xwe ber bi asimanan radikir û dikûriya:

»— Mekrûs, Mekrûs!...« Hertim ev berpêsîrên wê diqetiya û memikên

wê weke du şemamokan heta nîvî tê de dixuyan. Rojekê diya min  
jê re

got:

»— Tu êdî mezin î, Kewê. Tu çima bi daran ve hildiperikî? Binêre  
98

guhanên te derketine rastê!...« Kewê bi ruyekî xemgîn di ser  
guhanên xwe

de nêhirî, destê xwe havêt serê wan, hinekî pê lîst û dû re li diya  
min

vegerand:

»— Ji ber ko li wir, li ser daran ez baştir wan dibînim. Tiştên ko hûn  
nikanin bibînin, ez li wir dibînim. Aferîdên asimanî gelekî ji yên  
dunyayî

çêtir in. Porên wan dirêj û fîlikî ne. Weke histêrkan xwe ji jor de  
berdidin

xwarê. Kincên wusa tenik, wusa tenik li wan e ko meriv dibêje qeyê  
ji

hundurê hêkê derketine. Ez derdikevim ser daran ko Mekrûs destê  
xwe

dirêjî min bike û min jî bibe ba xwe û wan. Dixwazim bila dîsa destê  
xwe

bi memikên min bike û bibêje: Nermik û xweşik in.« Wê çaxê jî diya  
min

hinekî veniciqî, bi awurên dilverişîn li vê keçikê nêhirî... rihma  
Xwedê li

herduyan jî be, diya min lê xeyidî û gotê:

»— Ev çî xaxên te ne, dêlika dîn!... kerê welle ez ê ji bavê te re bibêjim!...

ez ê bibêjim, bila porê te kur bike, poz û guhên te jêke!...« Li hemberî van

gotinên diya min, Kewê... Kewa reben wê çaxê pêsîrên xwe di nav wan rî-

talên ber hemêza xwe de veşartin û bi enirîn di ber xwe de got:

»— Mekrûs ji min re goti bû: kî destê xwe bi te bike, destê wan ê bişikê.« Diya min dîsa li vê rebenê hêrs bû û gotê:

»— Ne tu bî, ne jî Mekrûsê te!... Kî dizane bê kîjan nerindî di tariya şevê de dest havêtiye te!... careke din jî ez nebihîsim, dêlik!...« Lê Kewê

dest pê kir û bi dilekî şewitî giriya. Ji çavên wê î gir weke xilorîgê hêsir ri-

jiyan. Heta ko diya min rabû çû jê re hinek nan û mast jî hanî û li ber danî, ew her digiriya...

Mereqdarî li Nêrgisa koçer dipiçike û ji Xanê dipirse:

— Mekrûsê ko çêlî dikir kî bû, metê?

— Gelek tişt hatin gotin, lê nizamim. Pêşiyê gotin tişteki bi vî navî tun-

eye. Dû re gotin, Kewê bi xwe ji xwe re tişteki weha afirandiye... De êdî

Xwedê pê dizane bê çî bû, kî bû... Lê li gor gotina diya wê, êvarekê serêşekê bi Kewê girtiye û dû re jî agirê wê bilind bûye. Diya wê hanîye li

ber argûnê eywana malê şeltikek raxistiye û Kewê li ser dirêj kiriye. Heta

demekê jî ne hatiye ser xwe û hertim pesta gotiye. Gotinên ko ji devê wê derketine, hemû jî nîvçe bûne û loma diya wê tenegehîştîye. Bi gavekî nalîna wê hatiye birîn û deng jê derneketiye. Diya wê jî rabûye ko biçe kaniyê û dorek av bîne. Lê dema ko diya wê ji kaniyê vegeyriyaye, mêze kiriye ko finda li paş serê wê vemirî ye. Tenê soraviya terafa agirê argûn li ser ruyê Kewê pirpitîye. Kewê rûniştî bûye. Dema diya wê dîtîye ko kewê hatiye ser xwe û ji xwe re rûniştîye, hinekî kêfa wê jî hatiye. Lê tavilê tirsek

99

ketiye dilê wê û bi şikebarî gotiye:

»— Tu çima di tariyê de rûniştîye, ez be qurban! Finda xwe vêxîne, Kewa min!..« Lê Kewa wê deng ne kiriye. Her li terafa agirê argûn mêze kiriye. Diya wê find vexistîye û dîtîye ko ev berpêşîrên Kewê vekirî ye û porê wê jî hinekî li hev ketiye. Pêşiyê diya wê gotiye qeyê ji ber agirê serêşa xwe bişkovên berpêşîrên xwe vekiriye û loma li ser ne sekinîye. Dû re bi dengê dayikek dilovan dîsa ji keça xwe pirsîye:



»— Êşa serê keça min hinekî derbas bû, an ne?« Li ser van gotinên diya  
xwe, bêyî ko li ruyê diya xwe mêze bike, Kewê gotiye:  
»— Erê, anuha êşa serê min ne maye. Mekrûs hat. Destê xwe da ser  
eniya min. Tiliya xwe di lêvên min re da. Dû re... dû re jî destê xwe di  
paşila min re kir û got: Nermik û xweşik in.« Diya wê bi tirs veniciqîye,  
baş bala xwe daye pêsîrên Kewê û dewsa nînog û perîncokan bi çavên xwe  
jî dîtiye.  
Tirs û mereqdarî li Nêrgisa koçer tevlihev dibe, ji hêlekê ve guhdariya  
Xanê dike û ji hêlekê ve jî bi gavekî zûtir dixwaze hîn bibe ka dû re çi bi  
serê Kewê de hat, bi tirs, bi çavên gir, bi dilpekîn dipirse:  
— Lê... dû re, metê?...  
— Dû re jî Kewê her bi navê wî jiya. Di kuçan de dibeziya û digot:  
»— Mekrûs destê xwe bi çiçikên min kiriye! Ew ji min hez dike! Dilê wî ketiye min...« Çi dizanim.. lê paşîngê jî pir xirab bû. Bi şev radibû berê  
xwe dida Şikefta Zoncikê. Te Şikefta Zoncikê ne dîtiye, li berwarê benda  
mala Baço ye. Dibêjin hundurê wê wusa tarî, wusa tarî ye ko... mên bi  
mêraniya xwe newêrin bi tenê dakevin hundurê wê. Dibêjin ji me çêtir,

ciyê şayiya cinan e. Di hemû şevên çarşemiyên de, ji me çêtir, cin li wir şayiyê dikan. Pirî caran meriv di wir re derbas bûne û dengê def û bilûra şayiya wan bi guhên xwe jî bihîstine... A Kewê jî di van şevan de diçû wir.

Gundiyan çend caran ew ji nivê rê vegerandin û hanîn malê. Dê û bavê wê lêxistin, di kadîne de girêdan, havêtin paş deriyan û nanrijî kirin... lê dîsa jî ev keçika ha ne hat ser xwe. Birin ser vî Mekanê Mala Dînan çend şevan heta destê sibê ew li wir bi darê ve jî girêdan, dîsa ne bû. Êdî lê azirî bû. Carina pir hêmin dixuya, carina jî har dibû, derdiket kuçê, dawa xwe di ser serê xwe de diqeliband, hetanî du saetan jî xwe hildikuta û digot:

»— Çarşemî û pêncşemî!...« Li Şikefta Zoncikê hînî vê dîlana... ji me çêtir, hînî vê dîlana cinan bû bû. Ji bilî van herdu rojan roja îniyê an jî ro-  
jeke din ne dihanî ser zimanê xwe. Dû re bavê wê bihîst ko li Cizîrê şêx-  
ekî bi navûdeng heye. Bavê wê î reben!... tê bîra min hertim ev keçika di-  
100

da pey xwe û dibir. Piştî du sê caran vê keçikê êdî ne dixwest biçe.  
Asê

dibû, çêr û dijûnên nemayê ji şêx re dikir. Direviya. Ji hemû  
gundiyan di-

reviya. Berê gelek ji diya min hez dikir, lê di demên xwe yê dawîn  
de êdî

ne dihat ba diya min jî. Ji bavê xwe jî direviya. Bavê wê bi benê tûr  
herdu

destên wê girêdida, li pey xwe dikaşîşand û dibir. Heta paş axpîna  
jorîn

jî qêrîna vê rebenê dihat û digot:

»— Mekrûs bireve, Mekrûs!... Şêxê Cizîrê bêbext e, ew ê te bikuje  
û

mala min bişewitîne, Mekrûs!...«

Dilê Nêrgisa koçer tenik bûye, bi tirs, bi dilpekîn, bi gewriyeke tije  
girî

û bi çavên tije hêsir dibêje:

— Dû re... têderxistin bê Mekrûs kî bû, metê?

— De êdî Xwedê pê dizane. Li gor gotina şêx jî, Mekrûs, xortekî ji  
wan

bûye... ji me çêtiran. Kewê bi wî re zewucî bûye. Ne dixwest şêx wî  
xortî

ji ser rake... Li gor gotina bavê wê, şêx gotiye:

»— Ji wan du babet hene. Hinek baş û hinek jî xirab in... Mekrûs ji  
ew

yên çê ye û bêkês e. Mekrûs wê bernade û keçik jî pir ji wî hez dike.  
Keçik

hertim wî haydar dike ko neyê nekeve daf û avê. Ez dixwînim,  
dixwîn-  
im... ji wan gelek tîn, lê Mekrûs nayê. Bila keçik li vir be, wexta ko  
ez ba  
lê bînim, ez ê ji ser rakim.« Herweha ev keçika ne hat, her carê bi  
qasî  
heyşteki li ba şêx dima. Ji xwe bavê wê çend caran tenê ew bir. De  
îcar...  
karê Xwedê nexşîn e!... ez baş nizanim, lê dû re ev keçika ha bi zarok  
nexweş ma û di devê gundiyan de bû benîşt. Her yekî ji xwe re tişteki  
li  
hev dihanî û zimandirêjî dikirin. Paşîngê şêx bi bavê wê dabû zanîne  
ko  
Kewê ji Mekrûs bi zarok nexweş e. Ev jî ji bavê wê re bû kuleke serê  
ku-  
lan û mîna ko êdî ji herdu dunyayên Xwedê jî bar keti be hustuyê  
rebeno... şerm dikir, ne dixwest çavên wî bi gundiyan bikeve.  
Digotin,  
êdî ne diçû limêja îniyê jî. Heta ko rojekê ev keçika ha mir.  
Nêrgisa koçer bi rewşeke sipûsar li Xanê dinêre, mîna ko dawiyêke  
we-  
ha ne dipa, lêvên wê yên zuwa dilive û bi kelagirî dibê:  
— Mir?...  
— Erê, mir... mir, lê mirina wê jî bi rengê xirab bû. Hinekan digotin,  
ji me çêtir, cinên wê ketine ser û hinekan jî digotin bi dermanê  
kêçan  
miriye. Xêr û guneh li hustuyê wan... lê digotin bavê wê dermanê  
kêçan

bi wê daye xwarin ko jê pak bibe. Tew pêşanî hukumatê jî ne dan û wusa

veşartin. Ma tu dibêjî dildariya kesên dîn û cinî!... Diya wê çêlî dildariya

wê dikir, digiriya û digot:

»— Di ber mirina xwe de jî Kewê xwe li ser sekûkê diqepijand, Mekrûs!

101

Mekrûs!... hewar dikir, bi çavekî bêguman vedigeriya ser min û digot:

Heta anuha jî ez û Mekrûs, em bi hev şa ne bûne.«

Li hemberî vê bûyerê, mitûmatî û dilpekiya Nêrgisa koçer lê zêdetir û

dilê wê teniktir dibe, çavên xwe mezintir dike û dîsa vedigere ser Xanê:

— Metê heyran, lê bavê wê çi digot?

— Bavê reben!... De êdî bavê wê î reben jî keti bû çi rewşê! Xwedêyo,

bûyereke weha di serê dijminan de neyê! Piştî mirina wê, devê bavê wê jî

hati bû girtin û ziman lê ne digeriya. Şênîyên gund ji kêleka wî kêm ne

dibûn, lê dîsa jî bêkês bû. Digotin, di quncikekî oda mala xwe de rûniştî

bû, ji ciyê xwe ranedibû, li dora xwe mêze ne dikir, ne nan û ne jî av...

tiştekek ne dixwar. Jina wî digot, ji ber mirina Kewê wusa bûye. Ji xwe  
bi  
heyşt rojan piştî mirina keça xwe, ew jî tetirxanî bû û mir.  
Nêrgisa koçer tengijî ye, xençer lêkeve xwîn jê naçe, tişteki dilhejin  
li  
gewriya wê dipiçike, kirtika pozê wê dişewite, firnikên wê pêl didin,  
lêvên  
wê diricifin, dixwaze tişteki din jî bibêje, pirseke din jî bike, lê  
kelagiriyê  
li gewriya wê rê nade wê, hemû hêza di xwe de berhev dike û ji  
nişka ve:  
— Lê... diya wê?... dibêje û bi vê pirsê xwe re kûrîniyeke ji dilekî  
şewitî  
pê dikeve, Xanê xwe davêje ser Nêrgisa koçer, bi kujê dawa kirasê  
xwe  
hêsirên rijiyayî paqij dike û:  
— Wî... ez bi qurbana te, tu çima dilê xwe tenik dikî?... Tu diya wê  
dipirsî, diya wê sax e. Ma tu Leto nas nakî? Xaltiya Leto diya wê ye.  
Lê ew  
jî... tu jî dibînî ko ew jî êdî ji serê xwe çelq bûye. Û loma hersal dema  
ko  
kulîlkên payîzê li ser goristanê serê xwe derdixin, ew jî diçe di ser  
gorna  
Kewê de, di xwe de lîlikan dibarîne, dilorîne... heta serê payîza paşîn  
jî  
karê wê her ev e.  
Nêrgisa koçer êdî bi deng digirî, ji bo ko kesek di kuçê de nebîne û  
ew

jî şerm neke, radibe diçe hundurê goma mala Xanê ko li wir bi dilê  
xwe

bigirî, Xanê serî gavê diçe ber deriyê goma berxan û jê re dibê:

— Erê de derkeve, ma tu dîn î!

Nêrgisa koçer li wir têr digirî, çavên wê ji girê sor dibin, heta demeke  
dirêj jî av ji pozê wê tê û dibe fişkefişka wê, Xanê li vê rebeniya  
rewşa wê

dinêre, ji gomê derdixe û bi pişirîn dibêje:

— Tu ji xwe re têr girîyayî, ne wusa?

Nêrgisa koçer serê xwe dixê ber xwe, deng nake, li ruyê Xanê jî  
mêze

nake, mîna ko di ramanên xwe de li tiştêkî asê bibe, di ber xwe de  
her li

derekî, li qirşekî, li keviyekî piçûk temaşe dike, Xanê dixwaze ko  
hinekî

dilê wê î guvişî xweş bike, bi rûkenî dibêje:

102

— De ka bibêje, Siyabend ji te çî dixwest, miqûfê!...

Lê ev henekên Xanê şopên girî ji xweşruiyê Nêrgisa koçer wenda  
nake,

nola ko guhdariya sitraneke dilşewat kiri be, anuha dilê wê nerm û  
tenik

bûye, xemgîn ketiye û êdî nikane zêde jî bipeyive, tenê bi pişirîneke  
xem-

sar, di ber xwe de û bi dengêkî nîvçe dibêje:

— Ez jî dikim êdî biçim, metê.

— Erê, de tu rûniştîyî, lê!... ma hêka te li malê sar dibe!

Nêrgisa koçer bi fişkefişk, bi dijwarî pişirîneke hûrik dikişîne ser  
lêvên  
xwe, bi Xanê dide zanîn ko divê ew biçe, xatir jê dixwaze û di ber  
beroşa  
gêrmiyê re ji hewşê derdikeve, heta derê hewşê Xanê jî li pey wê  
rast dibe,  
li wir çavên wê bi du zarokan dikeve ko li kolanê di nava xweliyê de  
dilîzin, bi du dangan bangî wan jî dike ko werin gêrmiyê bixwin.

103

Mamoste Kevanot li ber deriyê mala Şero, ji hêla hewşê dengê Mîxo  
î  
notirvan dibihîse:  
— De rabe, malava! Ro çû ava, ma tu ê kengî serê min çêkî?  
Şeroyê xwediye hewşê jî bi rikebarî lê vedigerîne û dibêje:  
— Bi navê Xwedê, heta ko tu peran nedî min, ez destê xwe navêjim  
meqesê... de îcar te bawer kir!  
Di devê deriyê hewşê de mamoste Kevanot dinêre ko weke hertim  
ci-  
vateke piçûk li ser sekûka hewşa mala Şero li hev geriyaye, ev  
hewşa ha ne  
tenê hewşa vê malê, rasterast hewşa gund e, li hênikayiyên êvarên  
weha,  
hertim çend kes li vê hewşê peyda dibin, çend kesên ko vê hewşê ji  
oda  
gund diçêtirînin.  
Anuha jî Hoto î navmalok hatiye vir ko li riya avê temaşe bike, Mîxo  
î



notirvan dixwaze ko Şero yê xwediyê malê serê wî çêbike, lê Şero bi destêvirekî de ketiye û rêş dike, jina Şero li ber argûnê hewşê rûniştîye

kuftên dagirtî çêdike.

Mîna ko mamoste Kevanot ji vê bergehê xweş be, bi dengê nîvken û

nîvhenekî dibêje:

— Xuyaye dîsa hûn li ser tiştêkî li hev nakin.

Şero yê xwediyê malê:

— Binêre va xoce jî hat, bila ew... dibêje, tefşo û destêvire di destê xwe

de datîne hêlekê, radibe ser xwe, pêşa şelwarê xwe dawdişîne, ber bi

mamoste Kevanot diçe û didomîne: ji bona Xwedê bila xoce bibêje, anuha li bajêr çêkirina por û kurkirina riyekî bi çiqas pere ye, xoce? Mamoste Kevanot bi ken destê xwe davêje eniya xwe, dike ko buhayekî

berberiya bajêr bibêje, lê tavilê têdigêhîje ko wî hay ji tiştêkî weha nîne,

bi qasî hefteyekî beriya ko were vî gundî, serê xwe li bajêr daye çêkirinê û

anuha jî tew nayê bîra wî, jê û pê ve hertim ser û riyê xwe li vir, li ba Şero

daye çêkirinê û hertim jî bi deyn an jî bi pereyekî hindik, loma ew kenê

li ser ruyê wî hêdî hêdî divemire, lê ji bo ko mijara galegalê bidome û

germtir bibe, weha dibê:

— Em bibêjin ko seriyek bi deh panotan e û tev rî bi panzdeh panotan

e.

Bi tevgereke bêçare Şero herdu destên xwe ber bi Mîxo î notirvan vedi-

gire, nizim û bilind dike û dibê:

104

— A ez jî dibêjim, ji dehan, ji panzdehan panotekî bide min. Em gundiyên hev, nas û dostên hev in... Xem nake panotekî bide, bes e. Pere

pere ne!

Mamoste Kevanot pêşiyê li Mîxo î notirvan dinêre, dû re li Şero vedi-

gere û dibê:

— Ka ew dixwaze çiqasî bide?

Mîna ko Şero hêviyeke herî piçûk jî di muşteriyê xwe de nebîne:

— Nizanim, dibêje, ko bi daxwaza wî be, ew naxwaze tiştekî jî bide. Çiqasî dide bila bide, pere pere ne, lê ez bê pere çênakim û hew!

Mîxo î notirvan bi zimanekî tinazî:

— Ew bê pere tiliya xwe jî di çavê meriv re nake, dibêje, destekî xwe ber

bi beroşa kuftikan bilind dike û bi tinaz didomîne: Lê ko tu bibêjî: a ji te

re pênc panot û ji dêla heskê ve bi destê xwe wan kuftikan ji beroşê derxîne, Şero ê wusa bike... ez baş dizanim ko... ez bi sê kevirên jinber-

danê sond dixwim ko ew ê wusa bike.

Daxwazeke firqûzane bi mamoste Kevanot digire ko ew jî beşdarî vê

peymanê bibe, li Şero dinêre, pîj dike:

— Ya sitar!... dibêje, ewqas jî nabe, lo!... Ko bikani be bi lepan wan kuftikan ji beroşê derxîne, ez ê bi xwe jî pênc panotan bidime wî.

Bi van gotinên jorîn re Şero di ber xwe de hûr hûr dikene, dû re li mamoste Kevanot vedigere û dibê:

— Xuyaye perên te jî di te de dixurin, xoce.

Mamoste Kevanot jî bi vê nexweşiya rikebariyê dikeve û:

— Ango çi, dibêje, ma tu ê bikani bî bi lepên xwe kuftikan ji beroşê derxînî? Heta nuha jî min ne dîtiye ko yekî lepên xwe di ava kelandî de

kiriye û kuftik jê derxistine.

Şero kurt dibire, zendên piyê xwe ber bi jor hildiçine, nola ko ji van destên xwe hunereke veşartî pîşanî mamoste Kevanot bide, herdu destên

xwe weke du carûtên zengarî ber bi wî bilind vedigire û dibê:

— Perên xwe derxîne! De derxîne... ez ji te re keleke kuftik... perçekî herî piçûk jî tê de nahêlim, ez ê bi van destên xwe hemûyî derxim.

Mamoste Kevanot destê xwe davêje dizdanê xwe, ken bi yên dorê dikeve, Şero têdigêhîje ko peyman bêhenek e, li Şarika jina xwe vedigere

û dibê:

— Ma kuftên beroşa te ne keliyane, Şarê?

Jina wî li ber beroşê bi pilepil pê dide zanînê ko henekên ava germ tunene, dest û zend ê li wî biperite, lê pênc lib panotên hesinî ji dizdanê

mamoste Kevanot derketine û anuha di kefa destê Şero de ne,  
hemû  
kesên li wir li ber beroşa kuftikan dicivin, ew ê binêrin ka Şero ê  
çawa wan  
kuftikan ji beroşê derxîne, Şarika jina wî ji bêgavî sêniyeke fere tîne  
û dide  
hêla rastê.  
Piştî ko Şero avekê di ser destê xwe de dike, diçe di ser beroşê re  
dis-  
ekine, ava beroşê bi bilqebilq dikele, kufte di beroşê de zîz dibin û  
li hev  
diqulibin, Mîxo î notirvan li ber Şero digere û dibê:  
— Ez bi qurban, Şero! Tu were dev ji vê peymanê berde û serê min  
çêbike. Ez dizanim tu ê destê xwe bişewitînî û serê min ê jî bimîne.  
Şero:  
— Bi Xwedê ev perên ha êdî ji bêrika min dernakevin. Û ev perên  
ha  
perên pênc şeş seriyên weke serê te ye, Mîxo!... dibêje, ji nişka ve  
destê  
xwe î rastê di beroşê de dike û derdixe, kuftikekê di sêniyê de  
datîne, destê  
xwe li ba dike, sar dike, jan û tîna ava germ bi derxistina vê kuftika  
pêşîn  
re li tilî û pişta destê wî dide der, ji hewşê dengê ken û niçeniçê  
bilind  
dibe, bi berz û nizimbûna dengê ken re destê Şero jî dadikeve nava  
ava

germ û bi kuftikeke din û yeke din derdikeve, jina wî misînê avê tîne  
û

dibê:

— Piştî derxistina her kuftikekê ava cemidî li zenda xwe bike ko  
bila...

Mamoste Kevanot bi ken dest davêje misîn, ji destê jina Şero digire,  
li

hêlekê datîne:

— Bi Xwedê ez napejirînim, dibêje, wusa nabe... Di vê peymanana me  
de

ava misîn tune bû!...

Bi van gotinên mamoste Kevanot re soraviyeke şermokî li ruyê  
Şarika

jina Şero xwe dide der, mîna ko anuha mêrê wê di duelloyeke  
bêyom de

be, bi rewşeke bihêvî û dilekî şewitî lê dinêre, ev bergeha jina wî du  
sê

caran li perda çavên Şero xuya dibe û herweha ev peymanana kuftikan  
jê re

dibe dozeke namûsê, heta anuha jî dixwest ko destekî xwe, destê  
xwe î

rastê tenê bi kar bîne, lê anuha ew jan, ew şewat, ew peyman, ew  
pere û

ew şermesariya li ruyê Şarika jina wî lê dibe hêrs û vê carê herdu  
destên

wî di beroşê de dibin û ji ava kelî derdikevin, Şarika jina wî bi dilekî  
he-

lisî di ber xwe de dike pilepil û dibêje:

— Bi Xwedê ev mêrika ê xwe bişewitîne... ew ê xwe bikuje.  
Mîxo î notirvan vê carê xwe davêje bextê mamoste Kevanot, li ber di-

gere û dibê:

— Xoce heyran, xoce, jê re bibêje bes e, bila serê min çêke.  
Lê mîna ko mamoste Kevanot bixwaze ew pênc panotên wî heqê xwe

106

derxîne, tiştêkî din dibêje:

— Na na, kuftikek jî tê de bimîne, nabe. Li gor peymanê, divê perçên kuftikên jihevketî jî tê de nemîne.

Şero perçên kuftikên jihevketî jî di beroşê de nahêle, rasterast hîjdeh

kuftik di sêniyê de berhev dibin, ji serê tiliyên Şero heta ber herdu zendên

wî ditevizin, sor dibin, wusa sor dibin ko meriv dibêje qeyê çerm ji ser

rakirine, Şarika jina wî zûzûka misîn digire, avê li zendên wî dike û dû re

pê dide zanîne ko divê ew ava firingiyan di dest û zendên xwe bide. Ava firingiyan li dest û zendên Şero dibe û bi merxemekê têne pêçanê,

kenê ko vê carê ji hewşê bilind dibe êdî ne ewqas ji dil e, weke ji van kenên

ko pirî caran ji ehmeqiyê dibe, kenekî wusa bi taybetî jî li mamoste Kevanot xuya dibe, Mîxo î notirvan bi gazindarî di ber xwe de dike pilepil û dibê:

— Ez dizanim ko êdî serê min çênabe.

Diyar dibe ko êş û şewata zendên Şero nû xwe lê dide der, carina serê

tiliyên xwe bi hinek deverên zendên xwe ve dişidîne, lê dîsa jî bi tevgereke

serketî dibêje:

— Di roja îroyîn de dema ko meriv bibêje pere, ava çem û kaniyan dis-

ekine!...

Mîxo î notirvan dizane ko serê wî nayê çêkirinê, Hoto î navmalok: ez

birçî me, dibêje, diçe wê sêniya kuftikan digire û ber bi sekûka hewşê

tîne, hemû kesên li ser sekûka hewşê wê sêniya kuftikan datînin ber xwe,

bi ken û henek dest bi xwarinê dikin, di wê gavê de Bekoyê Garût di kuçê

de xuya dibe, di devê deriyê hewşê de dengê li mamoste Kevanot dike

û dibê:

— Ekmek sizda û ya bizda, xoce!(\*)

Xoce ji ber sêniya kuftikan radibe mîna ko parolayekê bibersivîne:

— Leşgerên şevê daketine newalê, dibêje û bi vê gotina xwe re destê

xwe davêje ber pişta xwe, di ber pişta wî de, di binê qutikê wî î fere de

tiştêkî wekî sing an jî lûleyekê dixuye, herçiqas ev hevokên jorîn bi awakî

sergirtî têne gotin, lê yên li ser sekûka hewşê têdigêhîjin, ew  
têdigêhîjin

ko îşev şeva nêçira çûçikan e, piştî ko Bekoyê Garût jî tê beşdarî  
sere-

moniya xwarina kuftikan dibe, Mîxo î notirvan û Hoto î navmalok  
pê di-

dine zanîn ko ew ê jî werin.

Kuftikên di sêniyê de diqedînin û beriya ko ji vir belav jî bibin, ev  
hogirên ha li hev dikin ko bi tariyê re li mala Bekoyê Garût berhev  
bibin.

107

Bi tariya êvarê re kesên navkirî li mala Bekoyê Garût amade ne,  
mijara

axaftina wan li ser darê lastîkê, nîşandarî, sipîndar û kevirên gulover  
e,

deriyê odê vedibe, Mem û Beşîr î xwendekar dikevîne hundur,  
mamoste Kevanot çav li van xwendekarên xwe dikeve, vedigere ser  
Bekoyê Garût û:

— Binêre, leşgerên şevê hatin, dibêje.

Herdu leşgerên şevê tîn, tûrê di destê xwe de datînin ber mamostê  
xwe,

li kêleka wî cî didine xwe û bi serbilindî pê didine zanîn ko wan heta  
anuha jî li Newala Cinan kevirên gulover berhev kirine.

Mamosta Kevanot destê xwe di tûr de dike, bi kêfxweşî mistekê ji  
wan

kevirên gulover derdixe, ber bi Bekoyê Garût dirêj dike û bi  
tevgereke

nepixî dibêje:



— Fermo, binêre!... ji Newala Cinan berhev kirine.  
Bekoyê Garût dest davêje bêrîka xwe, darê lastîkê jê derdixe, ji wan ke-  
viran yekî ji mista mamoste Kevanot digire, di nava qayişa lastîkê de bi cî  
dike, dide ber çavê xwe, ber bi jor du sê caran vedikişîne, berdide, serê  
xwe î piçûk di binê şewqê xwe yê gir î qilêr de dihejîne û dibê:  
— Ez bi heyrana te bim. Ji bona Xwedê ca lê binêrin! Keç e, keç!...  
weke  
çîpên keçeke berzewac!...  
Bi van pesinê Bekoyê Garût re, mamoste Kevanot layita xwe ya sê baterî ji ber pišta xwe derdixe, berê wê dide binê zikê xênî û vêdixe,  
ron-  
ahiya layitê li ser max û mertegên zikê xênî xelek xelekî belav dibe,  
çavên  
xwe ber bi jor dike, serê layitê badide û dixwaze tevayiyê xelekên ronahiyê  
li gulokekê berhev bike, lewra ew dizane ko ji bo nêçira çûçikan divê tîrêjên ronahiyê mîna gulokekê li derekê berhev bibe, xwendekarên wî di  
ciyê xwe de dikine pistepist, Mem xwe nagire û bi dengê piçûkekî dibê-  
je:  
— Hinekî din sî, mamoste, hinekî din sî bastir...  
Bekoyê Garût:  
— Belê, xoce, belê, gotina zarok e, hinekî din jî bastir bike, dibêje û van

gotinên zarok rast dipeytîne.

Mîxo î notirvan di bin çavan re li Hoto î navmalok dinêre, di ber xwe

108

de dikene, vedigere ser mamoste Kevanot, destê xwe ber bi wî dirêj  
dike

û dibê:

— Bi Xwedê, xoce, te jî rasterast xwiyê me girtiye.

Mamoste Kevanot van gotinan li dilê xwe nagire, şerm nake, bi  
pişirîneke şêrîn beşdarî kenê wan dibe, mîna ko wersira ava vî  
gundê ha

deşîfre bike, Hoto î navmalok dibê:

— Ê... ev bû sê sal ko xoce ava gundê me vedixwe, ma hîn jî xwiyê  
me

negire?

Di vê navberê de lastîk, kevir û layita wan amade dibin, selikekê  
didine

dest Beşîr, tûrê keviran bi hustuyê Mem de dikin, mamoste Kevanot  
jî

layita xwe ya dirêj digire destê xwe û radibin ser xwe, Bekoyê Garût  
dîsa

lastîka xwe ji hev dikişîne, berdide, berê xwe dide Mîxo î notirvan û  
Hoto

î navmalok:

— Hûn ê jî çûçikan berhev bikin, serjê bikin, bavêjin selikê.

Mîna ko ew ê hêrişî ciyekî bikin, bavêjin ser derekê û wir  
bişewitînin,

bi reng û dilpekiya leşgerên şevê yek bi yek li pey hev derdikevin,  
bêgu-  
man dilpekiya mamoste Kevanot ji ya hemûyan jî bêtir e, nêçirvan  
ji dara  
hewşa mala Bekoyê Garût dest pê dikin, mamoste Kevanot berê  
layita  
xwe ber bi jor dike, tîrêjên ko li hev bûne gulok li ser giliyên dara  
tûyê di-  
gere, li derekê disekine, bêyî ko layita di destê xwe de bilivîne an jî  
destê  
wî biricife, bêyî ko serê xwe li hêlekê bizivirîne, bi serbilindiya diyîna  
tiştêkî nû dengêkî li Bekoyê Garût dike û:  
— A ji te re, Beko!... dibêje, xenîmê çavên te be, ma ez hîn ji te re  
çi  
bikim! Weke sîngê...  
Sîngêkî sipî li ser giliyekî jora darê ketiye lîsê, Bekoyê Garût nîşanê  
li wî  
sîngê sipî digire, qayîşê vedikişîne û berdide, bi tepîneke bêcir re ew  
sîngê  
sipî ji wir, ji ser giliyê jorîn bilind dibe û tê xwarê, nola pisporekî vî  
karî  
ha mamoste Kevanot vê carê jî ronahiya layita xwe serjêr dike, çûçik  
li  
erdê dipirpîte, dilpekiyeke kêfxweşîn bi xwediyê layitê digire, rê  
nade  
yekî din û ew bi xwe dibeze ser çûçikê, ji erdê radike û bêyî ko pirs  
kêrê

bike, mîna lehengekî Fiesta de Sangre(\*) taviî serê wê hildiqetîne,  
bêhn

û tîna çilkên xwînê xwe li tiliyên wî dide der û çavên xwe li selikvan  
di-  
gerîne.

Fiesta de Sangre: Bi spanî ye û tê mana »şayiya xwînê«. Di vê şayiye  
de

spanî bi gelek babetan bi xwînê dilîzin, xwînê dirijînin. Ji babetan  
yek jî

ev e ko mirîşkên ganî bi werîsekî ve ji lingan serjêr darde dikin, bi  
rext û

109

Hemû kevirên ko ji lastika Bekoyê Garût derdikevin, yek jî vala naçe,  
bi havêtina her kevirê re çûçîkek reben ji lîsa nîvê şevê dihecire û  
tê

xwarê, li binê vê dara hewşê rasterast yanzdeh çûçîk ji lîs û serê xwe  
dib-

in, dû re jî wekî nêçirvanekî kevnare mamoste Kevanot berê xwe  
dide

kesên dora xwe û dibêje:

— Anuha jî divê em xwe berdin nava sipîndaran.

Nêçirvan bi gotina mamoste Kevanot dikin, bi ronahiya layita wî ji  
wir

dûrdikevin, di pêş malan re, di paş sergo re hokê li xwe badidin û  
hêdîka

xwe berdidin nava sipîndaran, li gor rêdara nêçirvaniyeke weha,  
divê bê-

deng dakevine nav daran, an ne çûçik ê ji lîsa xwe bihecirin û bifirin,  
lo-

ma di ronahiya layitê de heta ko ji destê wan tê li gor rêdara vê  
nêçirvaniyê

dikevine nav sipîndaran û dest bi karê xwe dikin.

Bekoyê Garût bi dengê nizam vedigere ser mamoste Kevanot  
dibêje:

— Ca ji xwendekarên xwe bipirse, xoce... bipirse ka çend kevirên  
wan  
mane.

Beriya ko mamostê wî pirseke weha jê bike, Mem î berpirsiyarê tûrê  
ke-

virên gulover di tariyê de destê xwe î piçûk ber bi ronahiya layitê  
bilind

dike û dibê:

— Tenê ses kevir mane.

Mamostê Mem vê peyvika xwendekarê xwe serast dike û dibê:

— Tenê şeş kevir mane, Beko, bi gotineke din têra şeş çûçikan  
mane.

Bêyî ko hustuyê wan biqurime, nêçirvan di nava sipîndaran de bi  
qasî

du saetan çavên xwe ji pey ronahiya layitê nakutin û li jora  
sipîndaran

dinêrin, heta dawiyê bi tevayî çar kevirên Bekoyê Garût vala diçin,  
ew jî

du libên wan davêje bergekî sipîçolkî loma.

Selika di destê Beşîr de bertije dibe, carina destê xwe î piçûk li ser  
pûr-

ta çûçikan digerîne û pê kêfxweş dibe, carina jî di dilê xwe de  
xwezila xwe

bi nîşandariya Bekoyê Garût tîne û ji kwîr de keserina vedide.

Nêçirvanên çûçikên şevê ji nava sipîndaran derdikevin, ji wir  
dûrdikevin, li mala Bekoyê Garût vedigerin, heta ber deriyê hewşê  
jî mi-

postal, li ser piştta hespê bi bezeke siwarî di binê vî werîsî re derbas  
dibin,

dest davêjin serê van mirîşkên dardekirî ko bi carekê re hilqetînin.

Ko si-

warê hespê bi carekê re bi ser nekeve, an jî ko mirîşik xwe hilkute û  
serê

wê bi dest siwar nekeve, wê çaxê li gor berbora spaniyan ew sala  
ha ê ji bo

wan bibe saleke reş. Weke şayieke netewî ev şayiya ha hersal li  
Spanyayê

tê pîroz kirin.

110

jara peyivîna wan pesin e, pesinê li ser nîşandariya Bekoyê Garût e.

Mîna ko ji mamoste Kevanot re bibe xwiyekî hertimî, çer ko xwe  
digi-

hîne hewşê dîsa ronahiya layitê ber bi jor dike û dibîne, dibîne ko  
çûçikekê xwe daye ser giliyekî herî jor, xwe diricifîne û ji bo lîsê cî  
dide

xwe, xuyaye ko hîna nû ji nava sipîndaran heciriye û hatiye xwe  
havêtiye

bextê vê dara hewşê, Bekoyê Garût bi quretiya nîşandarekî mezin  
lastîka

xwe ji hev dikişîne û dibê:

— De qeyê nan û ava vê rebenê jî li ruyê vê dunyayê ne maye.

Nêçirvan dikenin û Mîxo î notirvan zûzûka dibê:

— Na Beko, na... ez bawer nakim ko tu wê çûçikê bixînî. Ko tu bi ke-  
virekî re wê bixînî, a ev simbêla reş jî ji min re ne pêwîst e, bavo!...  
ez ê kur

bikim!

Bekoyê Garût lastîkê di destê xwe de sist dike, ji nîşanê vedixe,  
vedigere

ser Mîxo î notirvan û dibê:

— Çima, bavo? Ma ew simbêla ji te zêde ye, an li ser lêvên te yên  
dirêj

giraniyeke xwe heye?

Dîsa kenekî dengdar bi nêçirvanan digire, mamoste Kevanot berê  
layi-

ta xwe bi Bekoyê Garût de dike, dû re vedigere ser Mîxo î notirvan  
û dibê:

— Baş e, ez jî dibêm... ez jî dibêjim ko Beko ê bi kevirekî re bixîne.

Ko

bixîne, tu ê ji simbêla xwe bibî, Mîxo... Ko nexîne, wê çaxê ez ê  
simbêla

xwe ya sor kur bikim!...

Ken li nêçirvanan bilintir dibe, dilê wan bêtir dipeke, herdu alî li hev  
dikin û ji Bekoyê Garût re dibêjin:

— De baş e.

Bekoyê Garût li herdu rikebaran vedigerîne û dibê:

— Anuha... li gor vê peymanê ko ez wê çûçikê bixînim jî û nexînim jî,

her ew ê simbêlek here, ya rastî heyfa min bi simbêlên we tê, lê hûn werin

em dev jê berdin, bila simbêlên we li ber pozên we bimîne û ev çûçika ha

jî îşev nehecire...

Lê herdu nêçirvanên xwedîsimbêl bi hev re û bi devekî rikebar dibêjin:

— Na na!.. Tu bi serê Xwedê dikî... bi vî Mekanê Mala Dînan dikî, tu ê bavêjî!...

Yê mayî, Hoto î navmalok jî vê hingemê pîj dike, sor dike û dibêje:

— Na na, Beko, tu bavêje. Lê bila ew jî sond bixwin ko ew ê bi rastî simbêlên xwe...

Herdu xwediyên simbêlan dîsa bi hev re û bi dengekî bi Mekanê Mala

Dînan sond dixwin, bi vê sonda mezin re ronahiya layita di destê

111

mamoste Kevanot de ber bi jor radibe, li ser giliyê dara hewşê digere,

çûçik hîn li ciyê xwe ye, Bekoyê Garût lastîka xwe ber bi wê vedikişîne,

beriya ko berde bi pilepil:

— Heyfa min ê bi simbêla reş were, dibêje û berdide, bi tepînekê re dengê hîshehîska zarokekî tê bihîstin, mamoste Kevanot ronahiya layitê



ber bi dengê hîskehîskê, ber bi hêla der, ber bi serê kuçê dirêj dike,  
dinêre

ko zarokê e, li ber tîrêjîn layitê mîna ko bi lîlikên çavên xwe  
alîkariyekê

bixwaze her dihîske, Mîxo î notirvan bangî wî dike û dibê:

— Çi ye, Salo?... Çi fişkefişka te ye?

Saloyê ko li bendî alîkariyekê ye dilê wî tenik dibe, ew giriyê ko li  
gewriyê piçikiye bi carekê re berdide û kûrekûreke dilşewat pê  
dikeve:

— Ba... bavê min... dimire! dibêje û ber bi mala seyda dibeze, ji bilî  
Mem û Beşîr hemû nêçirvanên şevê berê xwe didin mala Cindîyê  
bavê

Salo, xwendekarên mamoste Kevanot an jî bi gotina wî, leşgerên  
şevê jî

tev selika çûçikan bi pêlikên mala Bekoyê Garût ve hildikişin jor û li  
wir

li bendî wan disekin.

112

Jin û zarokên Cindî li ber serê wî rûniştine û bi hîskehîsk diqirqilin,  
nêçirvanên şevê xwe digêhînin paş serê wî û dorê lê digirin, ji wan,  
ji yê

dorê dengê nizim tê bihîstin û dibê:

— Dîsa ji me çêtir, cinên rebeno pê girtine. Ev rebenê ha jî ji wan  
pîrozweran pak ne bû...

Lê ev rebenê ha ne hay ji hatina nêçirvanan heye û ne jî ji peyivîna  
wan,

heta ber gewriyê bi lihêfekê nixumandî ye, çavên wî vekirî û bi baldarî li

binê zikê xênî dinêre, mîna tawanbarekî ko li bendî dadpirsiya xwe be,

dilê wî çargopal lêdixe, ditirse ko vê carê çî êş û şikence lê bibe, dilopên

xwîdaneke hûr li ser eniya wî nola serê germijokan dide der, binê porê wî

şil û bêhna nexweşiyêke bênav jê tê, ji nişka ve ricifiyek tê giyanê wî, gwîn

lê zer dibe, serê xwe li ba dike, bi dilekî şewitî dest bi bergerînê dike û

dibê:

— Ez bi qurbana we, zarokên min hûr in. Hûn ji me çêtir in, dev ji min

berdin! Ez rebenekî Xwedê me!...

Dû re girîyekî nîvxeniqî li gewriya vî rebenê Xwedê dipiçike, ew gwînê

wî yê zer vê carê sor dibe û dû re bi mor dixeniqe, serê xwe bêtir li ba dike,

digirî, dikûre, diqîre:

— Na... na, ez bi goriya we!... Sînoyê min piçûk e, kezeba min e... ez nikanim!... Destê min lê nagere... Hewar! Baş e, baş e... De wî tevşoyî

bidine min! Ez ê bi ya we bikim... ka wî tefşoyî bidine min! dibêje û destê

xwe di binê lihêfê de diqoqizîne ko derxîne.

Mîxo î notirvan û Hoto î navmalok xwe davêjin ser sîngê Cindî, lihêfa

wî hişkfirî pê ve dizeliqînin, Bekoyê Garût bi herdu destan serê Cindî di-

gire ko zêde li ba nebe, mamoste Kevanot dibîne ko ew seriya weke kunekî şil di nava destên Bekoyê Garût de nahewe, loma ew jî destên

alîkariyê dirêjî serê Cindî dike û pê digire, bi vê alîkariyê re li ser wan destên xwe yên neşûştî çilkên xwîneke nîvter û nîvhişk, xwîna çûçikan

dibîne, di nava tiliyên wî de û bi vê xwînê ve du sê pûrtên çûçikan jî bi

ber çavan dikevin.

A di wê gavê de bêhna xwîdana nexweşiya Cindî û bêhna wê xwîna li

ser destên mamoste Kevanot li nav hev dikeve, xwe li pozê wî dide der, bi

113

tirs, bi dilverişîn destên xwe yên alîkariyê bi şûn de vedikişîne û bi çavên

xwe dibîne, dibîne ko Cindî nola rêsiyêkî gîyê li hev tê badanê, reş û mor

dibe, bêhna wî diçike, deng jê dernakeve, tenê carina bi dijwarî devê xwe

ji hev dike û dixwaze tiştina bibêje, lê ew gotinên ko ji devê wî derdikevin

mîna ko di nava diranên wî de hatine cûtin, bi melodî û fonetîkeke seyr

in, ewqas seyr û ewqas seyr in ko heta nuha jî zimanekî bi vê melodî  
û vê

fonetîkê ne hatiye bihîstin, ji kesên dorê yek şirove dike û dibêje:

— Ev zimanê wan e... zimanê aferîdên pîrozwer, zimanê cinan e.

Jina Cindî pêşa xwe dide ber devê xwe û bi şûn de xwe bi dîwêr ve  
dizeliqîne, ji nişka ve çav li mamoste Kevanot beloqî dibin, tevayiya  
zanistiya wî ya kevin û nû li nav hev dikeve, weke birûskekê di  
ramanên

wî de vedijine, bêyî ko tiştêkî ji hev derxîne di ciyê xwe de devjihevî  
dimîne, dest û lingên Cindî lê dibine weke ço, serê xwe li çep û rastê  
xwe

li ba dike, dev û lêv lê xwar dibe, xwe hildikute, xwe diguvişîne,  
dipirpîte,

Mîxo î notirvan û Hoto î navmalok tevayiya giraniya xwe didine ser  
dest

û çîpên wî û nahêlin xwe bilivîne.

Di vê navberê de pirtûka pîrozwer di dest seyda de dikeve hundur,  
tev

silaveke Xwedê bi dengêkî dagirtî û gewriyeke mîkrofonane:

— Zêde di ser serê wî re nese kinin, ne baş e, dibêje û zûzûka, bi  
gavên

ewle, bi rewşeke qure, bi tevgereke bêhenek heta baş serê Cindî  
diçe, li

hêla wî ya çepê cî dide xwe, devê pirtûka pîrozwer vedike û ji  
rûpeleke wê

tiştina dixwîne:

kul ûhiye îleyye ennehustem'a neferun minelcinnî fekaálû îinna  
semî'-

na Qur'ánen aceben  
yehdíy îlerruşdî feamenná bîh ve len nuşrîke bîrabbîná ehadá  
ve ennehu te'álá ceddu rabbîna mettehaze sahibeten ve la veledá  
ve ennehu káne yekuûlu sefiyhuná alallahî şetató  
ve enná zannenná en len tekuûlel'însu velcinnu alallahî kezîba

.....

Dengê xwendina seyda û giriyê Saloyê ko li pey wî ketiye hundur li  
nav

hev dikeve, dibe weke melodiya guvîna du mozên li ser kulîlkekê û  
li

guhên kesên dora Cindî datê.

Di piçûktiya Cindî de li gund pevçûnek çêdibe û ciwamêrek tê  
kuştin,

bi deh rojan piştî binaxbûna kuştî, hukumat dixwaze li ser cendekê  
mirî

otopsiyekê çêke, tev doktor, komîta hukmatê, muxtar, gundiyên  
dîdevan

û zarok jî berê xwe didine goristanê.

Ji taybetiyên gund yek jî ev e ko çî cendirme, çî doktor an jî perçê

114

makînekê ji bajêr were gund, tavilê bala merivan dikişîne, çî piçûk  
çî

mezin meriv li pey diçin û temaşa wan dikin, li ser goristanê dema  
ji hêla

seriyê mirî gornê dikolin, tev çend zarokên din wê çaxê Cindiyê  
piçûk jî

li wir e, bi çend denga doktor li van zarokan hêrs dibe û ji wan re:  
»Ji vir  
biçin, xwe bidin alî.« dibêje, zarok hinekî vedikişin û xwe didin alî,  
lê  
Cindîyê piçûk xwe dide aliyekî xirab û lê temaşe dike, temaşe dike  
û  
dibîne ko ew çawa gornê dikolin, bersalê di ser serê mirî re radikin  
û tev  
cawê sipî mirî ji gewriyê şerjê dikin, serê jêkirî radikin ko têxine  
sindo-  
qeke textîn, mîna ko bibêje: dev ji min berdin, ciyê min xweş e û  
bihêlin  
ez rihet bikim, di wê gavê de wek ko şênîyên gund dibêjin, ji şeytanî  
re  
serê mirî ji dest wan dişemite û dîsa gêrî ciyê berê dibe, wê çaxê...  
a wê  
çaxê ganîtiya vî seriyê ha tê ber çavên Cindîyê piçûk, ev seriyê ko  
hîn  
berîya bîst rojan li wî xeyîdîye an jî pê re pişirîye, keniyaye, anuha jî  
mî-  
na postekî gurandî bi bêhneke mirî, bi pirçeke nedaw û zeliqokî ye,  
ruyê  
wî reng havêtiye, bûye mîna hevîrekî binê êgir, nivkel û nepixî  
dixuye,  
belê... ev serî, ev seriyê ha dû re şevê nivên şevan jî tê xewnên  
Cindîyê  
piçûk û ji nava lihêfan dipengize, ev tirsê di dilê wî de nola zîroyekî  
dijî,

bi wî re mezin dibe û rojekê lê dibe nola marekî reş, Cindî mezin  
dibe,  
dibe xort, dizewuce û dibe xwedî zarok, lê ev tirs ha hertim di dilê  
wî de  
ye û ji wê rojê û vir de di peyivîna xwe de serê wî diheze, bi vî serê  
hezhe-  
zok weke karê her gundiyeke rojekê karekî Cindî jî bi bajêr dikeve,  
di ro-  
jeke zivistanê de heta ko bi kamyonekê xwe digêhîne taxa gund  
êvar lê reş  
dibe, dema ji kamyonê dadikeve berfek nû li ser ya kevin tê xwarê,  
bi qasî  
saet û nîvekê divê ji vir bi peyatî rê bikute, dunya sar û tarî ye, bi  
têra xwe  
ji gund dûr ew û tenêtiya xwe ye, bi çend gavên pêşîn re gelekî  
diricife, ji  
wî wetrê ji sermayê ye, lê piştî çend gavên din li xwe divarqile, li ser  
tenêtiya şereşeke weha difikire, ji çîrokên ber argûnan beşên  
xeternak  
têne ber çavên wî û dilê wî bi pêt hildavêje, zûzûka cixarekê ji bêrîka  
xwe  
derdixe, bi tirs dûtê wê dikêşe hundurê xwe, ji nişka ve bi qasî sê  
werîsan  
ji xwe dûr zoyekî guran li bendî xwe rawestî dibîne, tavlê di cî de  
rûdine,  
ji hêlekê ve hestê xwe dijene û ji hêlekê ve jî bi dengekî bilind diqîre,  
hewarê dixwaze, ji gundiyan çend kes vê hewarê dibîhisin, bi teqîn,  
bi

tifing ber bi deng dilezînin, gundiye ko xwe digêhînin hewara Cindî dibînin ko ziman li wî nagere, deng jê nayê, tenê destê xwe ber bi derekê

dirêj dike, gundî li wê hêlê dinêrin, ji bilî tûpekek reş tişteki din nabînin,

Cindî davêjin ser milên xwe û digêhînin gund.

A ji wê rojê û vir ve ye ko Cindî gelek carên mîna anuha dikeve nivî-

115

nan, bi tirs diqîre, hewar dike, li ber hinekan digere, di êş û azareke veşartî

de diqepije, diguşiye, qoçalî ser hev dibe, xwîdaneke weke avzêlkên serê

germijokan zer lê dide der û di her careke weha de jî bêguman şêxekî, sey-

dayekî an jî merivekî Xwedê xwe gîhandiye hewara wî, ne yek û ne dudu,

dibe ko heta nuha di van rewşên wî yê teng de, ji du hezar û du hevokan

jî bêtir, bi zimanê Xwedê peyv û gotin di ser Cindî de hatine rijandin.

Dengê xwendina seyda hatiye birîn, mîna ko ji xeweke giran şiyar bibe

Cindî di nava nivînan de xwe ji hev vedikişîne, çavên xwe vedike, ji niş-

ka ve bi tirs li dora xwe dinêre, çav lê dibin weke devê şikeftan û bi gavekî

behitî dimîne, paşîngê dixwaze çavên xwe bifirikîne, dike ko destên xwe



ji binê lihêfê derxîne, du destên girêdayî bi hev re derdikevin rastê,  
çer ko  
çav li vê rewşa xwe, li destên xwe yên girêdayî dixîne weke zarokekî  
heft-  
sale dest bi girî dike, ne ko tenê Cindî li ber vê rewşa xwe dikeve,  
herwe-  
ha yên dora wî jî bi mitûmatî dinêrin, dev û lêv li mamoste Kevanot  
zuwa  
û çavên wî beloqtir dibin, bi serekî tevlihev xwe bi xwe: »Ev destên  
girê-  
dayî ji kuderê derketin! Kê, kengî, çawa hatine girêdan?...« dibêje û  
ev  
pîrsên ha weke wersirekê di dilê wî de bi cî dibe, Mîxo î notirvan û  
Hoto  
î navmalok anuha têdigêhîjîn, têdigêhîjin ko di wê gavê de ev  
destên  
Cindî ne girêdayî bûya, wan ê pê nikanî bûya, seyda ditengije, hêrs  
dibe,  
xwe nagire, di ser nivînên nexweş de:  
— Ev çî ye, ezbenî? Destên te çima girêdayî ne? Ma ne va ye em  
hemû  
li dora te ne, dibêje û xerîkî vekirina destên girêdayî ye.  
Kewaniya malê dike ko tişteki bibêje lê Cindî kasikek av jê dixwaze,  
benê tûr ji destên wî vedibe, hêsirên xwe paqij dike, xwe davêje  
destên  
seyda, maç dike, di eniya xwe re dide, hîskikên girî û giryê  
bextiyariyeke

veşartî nahêle bipeyive, bi alîkariya destên seyda di nava nivînan de  
pal

dide, ava wî tê, vedixwe û dibêje:

— Ma ez ê çî ruyê xwe ji Xwedê, ji we reş bikim... anuha nû ez ji  
destên

wan pîrozweran azad bûm. Êdî ez dikanim... dikanim hertiştî  
bibêjim.

Ev bûn çendik û çend salên min ko ji me çêtir, ez di nava lepên cinan  
de

me. Ev çend carên min e ko ez dikevim ber deriyê dadgehên wan  
çêtiran.

Ji min re digotin: »Te xwe di ser newala pêş Şikefta Zoncikê re  
hilavêtiye

û wê çaxê te pêl pêçeka me kiriye...« Min xwe havêt bextê wan, ez  
çûm

dest û lingên wan. Car bi car, sal bi sal min bi wan pîrozweran da  
zanîn

ko min hay ji vê yekê ne bûye, min pêçek ne dîtiye... lê bergera min  
bi

kêrî tiştêkî ne hat. Ji me çêtir, wan di dadgehên xwe de li min didan,  
şikencên nemayê li min dikirin... çî dizanim. Di şevên nîvê şevan de

ji me

116

çêtir... dihatin bangî min dikirin, bi serekî serxew min jî dida pey  
wan û

ez diçûm...

Li vir Cindî vedigere ser wan kesên li dora xwe:

— Ma çima we jî ne didît? dibêje, destê xwe ber bi mamoste Kevanot

dirêj dike û didomîne: Bi taybetî jî te, xoce... ma te çend caran ez jî pişta

goristanê vegerandim? Lê wê çaxê jî min ji te re ne digot... ya rastî min

nikanî bû ji te re bigota. Lewra ji me çêtir, wan ji min re digotin:

»Nebêje!... Ji kesekî re nebêje!...«

Bi van gotinên Cindî re tiliya mamoste Kevanot jî dikeve nava van tiştên veşartî, ji nişka ve xwe gunehkar hîs dike û ricifiyeke sar û bêwext

digire ser laşê wî, di wê gavê de bi qasî demeke sê lêdanên dil bi raman

diçe wan şevên buhurî, di wan şevan de çend caran bi şev dîtiye ko Cindî

bi bertena derpê û kirasê dirêj û sipî ber bi goristanê diçe, an jî ji pala

goristanê berê xwe daye Şikefta Zoncikê, lê heta anuha jî bêyomiyeke we-

ha ne hatiye ser hişê mamoste Kevanot û li ser ne fikiriye, anuha, tenê

anuha û bi van gotinên Cindî re çav li serê wî çar vedibin, tirseke bêwext

dikeve dilê wî, guhên xwe baş vedigire û bêdeng guhdariya wî dike. Cindî didomîne:

— Belê, ez diçûm... ez diçûm û ji me çêtiran heta destê sibê bi min ke-

vir didane kişandinê. Ew kevirên zîndana xwe ya nû... hamû jî bi min

dan kişandinê. Di demên dadgehê de, wan pêşiyê ez dibirim dereke  
bi  
tirs û xewle. Ciyekî wusa bû ko çawa bibêjim, Xwedêyo!... ez ne  
bawer im  
ko ciyekî weha li ruyê dunyayê hebe. Ciyekî wusa tarî, wusa tarî ko...  
ji  
van tariyên ko me dîtine jî tarîtir... Ne agir û ne jî ji van lampên me,  
bi  
ronahiyeke seyr hinek tişt bi ber çavên min diketin, lê... de îcar ji  
me çêtir  
bergeha wan, Xwedêyo!... serê wan weke kartolên pelixî, pozê wan  
dirêj,  
an jî kurt û sitûr, çîpên wan zirav... dema ko dipeyvîn, tevayiyê  
diranên  
wan dihatin jimartinê. Bêhneke genî, bêhneke genî!... ya sitar!... li  
wir li  
min dixistin ko ez Sînoyê xwe....  
Li vir geweriya Cindî tije girî dibe, lêvên wî dilerizin, hevoka xwe  
nîvçe  
dihêle, bi çavekî şil li Sînoyê xwe dinêre û bi girî didomîne:  
— Ma min ê çawa Sînoyê xwe... bi... bi tefşo serjê bikira? Kezeba  
min  
e... Ji me çêtiran, îşev jî li min didan ko ez bi ya wan bikim. Sîtila  
qetranê  
dabûn ser agir, dixwestin serê min têxine nav... dixwestin ko ez bi  
gotina  
wan bikim. Êşa ko ew bi merivan didine kişandinê, ne ji van êşên  
dun-

yayî ne. Meriv debarî êşa wan nake. Meriv dixwaze çavên xwe jî derxîne

û bidine wan... meriv dixwaze wusa bike ko zû ji destên wan bifilite.

Lê

117

min dizanî bû... min dizanî bû ko ji me çêtir... ew ê min gelekî bêşînin.

Loma... min jî... ji Şaynazê re got... min jê re got, rabe van herdu destên

min hişkfirî girêde!

Di vê navberê de dengê hîskikên giriyê Şaynaza jina wî jî tê bihîstinê, Cindî dîsa bi şikirdarî xwe davêje destên seyda, dîsa di eniya xwe re dide,

destên xwe ber bi jor vedigire, keserekê vedide û dibê:

— Lê şikir ji Xwedê re ko min ev roja ha jî dît... Ez êdî merivekî azad im. Ez bi biryara serokê çêtiran hatim berdan. Şikir ji te re, Xwedê!...

Seydayê gund ji ber vê azadiya Cindî diwerime, dinepuxe, ko bi vatiyeyeke weha pîrozwer rabû û yekî mîna Cindî ji nava lepên cinan xelas

kir, serbilind dibe ko yek tewafî destên wî bû, kêfxweş dibe ko çend kesên

li wir jî ev kîramatên wî dîtin, hêvîdar dibe ko navûdengê wî ê belav bibe.

Lê mamoste Kevanot bêkêf e, bêhêvî ye, deng jê nayê, mîna ko ji xwe

şerm bike li dora xwe jî mêze nake, serê wî di ber de ye û guhdariya dengên odê dike, diponije, dixwaze têbigêhîje lê ji hev dernaxîne û

dudiliya gelek tiştên sergirtî di wê şevê de di wê gavê de lê çêdibe.  
Wê şevê Demo û Mîro şopa mamostê xwe digerînin, di hewşa mala  
Şeroyê berber re, di mala Bekoyê Garût re, di nav sipîndaran re û di  
dawiya dawîn de jî bi saloxdanên ewle têne mala Cindî, anuha li wir  
di  
devê deriyê odê de bi mamostê xwe didine zanîn ko naxir hatiye, li  
gund  
belav bûye, lê nogina wî di nav de tune bûye, ji gavanê gund pirsîne,  
dû  
re ber bi Kevirê Bagerê çûne, li Şikefta Zoncikê nêhirîne, çavên xwe  
li  
rezên jorîn û Newala Cinan gerandine lê wan nogina wî ne dîtine.  
Mamostê wan serê xwe radike ko bibêje xem nake, lê piştî ewqas  
bê-  
dengiya xwe Bekoyê Garût destê xwe ber bi zarokan bilind dike û  
dibê:  
— Xem nake, werin hundur, ma di vê payîza pêşîn de jî gur ê noginê  
bixwe!  
Mîna ko nû tişteke were bîra Mîxo î notirvan, li kesên dora xwe  
dinêre  
û dibê:  
— We qala guran kir, hat bîra min. Bi Xwedê, îro şivanên gundê  
Şirterûtê li çiyê digotin... digotin ko heta destê sibê jî kuçikên wan  
zûrîyane, ewtîyane û li dora colên wan çerx bûne. Şivanan xwe dane  
bendî, lê tişteke ne dîtine. Gumana du tiştan dikirin. Digotin, ko diz  
ne  
hati bin nêzîkî wan, wê çaxê ji sedî sed gur daketine.

Lê Bekoyê Garût ji gotina xwe danakeve, destê xwe jî li ba dike û dibê:

— Na, na... çî zû gur daketin! Gurên ko ewqas zû dakevin nikanin noginê jî bixwin.

118

Cindi di nav ciyan de berê xwe, destê xwe ber bi seyda dike û bi berg-

erîn dibêje:

— Seyda heyran, seyda!... çî dibe çî nabe, tu dîsa jî li ser devê guran bixwîne... devê wan girêde, nogina xocê me... xocê me reben e.

Erê an na, peyvikek hûr jî ji devê xocê reben dernakeve, bi ruhekî he-

lisî, bi laşekî tevizî, bi mejiyekî tevlihev, bi çav û awurên vikûvala li dora

xwe dinêre, dibîne an jî nabîne ko piştî çend gotin û lavelavên kesên li

wir, anuha qeytanekî mîna benê solan di dest seyda de ye, pêşiyê bi kur-

dî:

— Di Newala Cinan re... di pêşiya gundê Şirterûtê re... di Rasta Hespan re... di Girê Guran re... û di gelek ciyên din re, dibêje, paşîngê

vedigerîne zimanê erebî û didomîne: Kul huvallahu ehad allahussamed

lem yelîd ve lem yûled ve lem yekun lehu kufuwen ehad... piştî vê xwend-

inê girêkekî li wî qeytanê benê solan dixîne, pifî wê girêkê dike û  
dîsa  
vedigere serî, ji nû ve dest pê dike, careke din û yeke din û yeke  
din... heft  
destpêkên bi kurdî, heft dawiyên bi erebî, heft girikên kwîrikê li wî  
qey-  
tanê benê solan û heft pifên li wan girêkan... devê gur tê girêdanê  
û ew  
benê bi heft girêkên kwîrikê di bêrika mamoste Kevanot de bi cî  
dibe.  
Lê dîsa jî ew bêkêfiya ko bêwext, îşev û anuha ji nişka ve digire ser  
mamoste Kevanot, ji ser ruyê wî wenda nabe, ev nerihetiya ruhê wî  
bala  
kesên dorê jî dikişîne, napirsin û nabêjin çima, lê dibînin ko ew hişk  
û  
zuwa bûye, gwînê wî zer û çavên wî beloqî bûne, mîna ko destên  
xwe ji  
tiştêkî veşêre di nava şeqên xwe de dane ser hev û bêdeng dipê.  
Heta ko çay germ dibe, tê ber wan û vedixwin jî, mamoste Kevanot  
her  
bi raman e, her cara ko piyala çayê ber bi devê xwe bilind dike,  
bêhneke  
kambax, ew bêhna xwîdana nexweşiya Cindî û xwîna çûçikan hîs  
dike,  
mirûzê wî tal û gwînê wî vemirî ye, kêfxweşiya nêçirvaniya herşevîn  
li ser  
tuneye, diponije û tîne bîra xwe ka çend kes, çend caran bi şev li  
pala



goristanê xwe bi xwe dipeyvîn û diçûn, dixwaze ko taviê rabe ser  
xwe û

biçe malê, li ser cilê xwe ramede, li ser hertiştî ji nû ve dûrûdirêj  
birame.

Herçiças nêçirvan bi wî de dibêjin û dixwazin weke herşev biçin  
mala

Bekoyê Garût, goştê çûçikan sor bikin û bixwin, lê bi bihîstina  
peyvikên

çûçik, goşt û xwarinê dilê wî li hev dikeve û xwe nade ber vê yekê,  
piştî

vexwarina çayê, li rasta hewşa mala Cindî, mamoste Kevanot xatir  
ji wan

dixwaze û bi serekî tevlihev ber bi lojmana xwe dimeşe.

Ev tevliheviya ha di riya lojmanê de li serê wî dibe giranî, çogên wî  
diri-

cifin, lingên wî sist dibin û nikanin wî seriyê giran bikêşin, tenêtiyeke  
119

bêmane digire ser û tirseke kambax lê radibe, hîna ji dûr ve bi awakî  
dilşe-

wat, dengêkî mîna dengê kundekî ji nava reşayiya darên goristanê  
bilind

dibe û tê bi kerika guhên wî ve dizeliqe, di dilê xwe de, »Ev deng  
rengê

bêyomiyekê ye.« dibêje, ji bo ko vî dengê rengê bêyomiyê nebîhise  
herdu

destên xwe ber bi guhên xwe bilind dike, vê carê jî pozê wî pê dide  
zanîn

ko bêhna xwîn û pûrta çûçikan, bêhna xwîdana nexweşiya Cindî ji destên wî tê, ev kambaxtir e!... dema ko xwe digêhîne taxa goristanê êdî

gurpegurpa dilê xwe dibîhize, dibîhize ko dilê wî jê re dibê: »Nebe nebe,

di vê tariyê de li aliyê darên goristanê, li kêl û kevirên gornan mêze bikî!«

Mamoste Kevanot bi gotina dilê xwe dike û li wî aliyê mêze nake, weke

zarokên ko di hêlkanên xwe de keti bin xewê, miriyên goristanê jî bêdeng

in, tenê ew dengê bêyom ji hêla goristanê ji gewriya kundekî bilind dibe,

mamoste Kevanot bi gavên hêdî, wusa hêdî, wusa hêdî di ber goristanê re

derbas dibe ko meriv dibê qeyê naxwaze wan zarokan ji xewa wan şiyar

bike.

120

Wê şevê heta dereng jî mamoste Kevanot di paş piştta kewaniya xwe de

dikeve ramanan, diponije, diqepije û xew nakeve çavan, di tevliheviyekê

de ye û nikane ji nav derkeve, di dilê xwe de: »Meriv çi aferîdekî seyr,

rengîn û reben e, Xwedê!...« dibêje, ew hemû tiştên ko di jiyana xwe de

xwendiye, bihîstiyê, dîtiye, yek bi yek zûzûka li serê wî dikevin û  
dipen-  
gizin, vedigere ser metod û formulên zaniyaran ko têbigêhîje,  
têbigêhîje  
ka ev meriv î kambax çî ye û çendik û çend rengên xwe hene, yek  
dudu,  
du hezar û du rengên wan di serê mamoste Kevanot de li hev dikeve  
û  
dîsa ji nav dernakeve, vê carê fantazî û zaniyariyê dide ber hev û bi  
van  
herdu fenomenan diçe ser rengine meriv, dûrtir diçe, ji dunyayê  
derdikeve, bi leza tîrêjekê ji atmosferê derbaz dibe û ber bi  
histêrkan diçe,  
her ko dûr diçe seyrtir û reştir dibe, xwe berdide valayiya  
taristaneke  
gerdûnî, gêj dibe û dewxa wî diçe, çavên xwe digire tarî, vedike tarî,  
destê  
xwe li dor xwe dipelîne, jina wî li kêleka wî ye, bi dengekî nizim û  
zuwa  
şiyar dike, daxwaza hanîna pêşgîr û du aspirînan bi lêv dike.  
Jina wî pê dide zanîn ko mala wan ji mêj ve bê aspirîn e, radibe  
lampê  
vêdixîne, pêşgîrekê tîne, ji xwîdanê her deverê mamoste Kevanot  
bûye  
av, êşeke giran xwe di serê wî de badide, mîna ko di bahozê de li  
ser pêlên  
deryayekê be, bi her aliyê de ditewe, diqelibe, dikeve, tew carina  
wusa hîs

dike ko lojmana wan jî ditewe, bi jina xwe dide zanîn ko alîkariya wî bike,

alîkariya wî bike ko biçê û verişê.

Piştî ko vedirişê dîsa bi alîkariya jina xwe tê ser nivînan û gêjbûna serê

wî hinekî sivik dibe:

— Lampê venemirîne, dibêje û xwe dirêj dike, bi tirs û çavekî vala li binê zikê xênî temaşe dike, xwîdana ko li eniya wî berhev dibe jina wî bi

pêşgîrê baqij dike, ta û agirê di laşê wî de hîs dike, têdigêhîje ko mêrê wê

pir nexweş e, vedigere ser û dibêje:

— Tu li mala kê bûy? Dibe ko te di namkiyeke zengarî de tiştêk xwari be. Ez hinek şîr...

Bêyî ko mamoste Kevanot çavên xwe ji binê zikê xênî bikute:

— Na, dibêje, min tiştêk ne xwariye. Piştî nêçira çûçik...

Li vir dîsa ew bêhna xwîn û pûrta çûçikan tevlihevî bêhna xwîdana

121

nexweşiya Cindî dibe û tê xwe li pozê wî dide der, mirûzê wî tirşûtal dibe

û dibê:

— Bîne van destê min bi sawûneke bi bêhn bişo, Nêrgis.

Jina wî misîn, legan û sawûneke bi bêhn tîne destên wî dişo, bi pêşgîreke nû zuwa dike û bi hustuxwarî dibê:

— Hinekî baş bûy, an ne?

— Na, piçekî... Em çûn... ez li mala Cindî bûm. Nexweş bû. Çîroka

nexweşiya xwe ji me re got. Bi cinan keti bûye. Dev jê berde...  
çîrokek  
xemgîn e.

Peyva cin û ew bûyerên ko Nêrgisa koçer jî bihîsti bûn, di serê wê de

olan dide, xemgîniya çîrokên kesên cinî dilê wê jî dêşîne û dibê:

— Ji xwe çîrokên hemû kesên cinî xembar in... Dilê merivan bi wan dişewite.

Mamoste Kevanot bi baldarî berê xwe bi jina xwe de dike û bi mereq-

darî dipirse:

— Ma te jî dîtiye? Te jî dîtiye ko kesên cinî çêlî çîrokên xwe kirine?...

Cindî digot:

»— Heta nuha jî min ji kesekî re ne gotiye.« Tiştêkî seyr e! Ji jina xwe

re jî venekiriye. Cinên wî jê re gotine: Ji kesekî re nebêje!

Ew bûyerên ko Xanê ji Nêrgisa koçer re kat kiri bûn, yek bi yek têne ber

çavên wê û bi ruyekî saxikane dibê:

— Na, min ne dîtiye, lê min ji devê meta Xanê bihîst. Çêlî cinîbûna keçeke berzewac jî dikir, Xwedêyo!...

Mamoste Kevanot li ser nivînan ramediyaye, jina wî li kêlekê rûniştiye

û wan hemû tiştên ko ji Xanê bihîstine jê re kat dike, mîna ko guhdariya

mîtolojiyêke binê erdê bike, bi baldarî guhê xwe daye ser gotinên jina

xwe, carina bi pirsên kurt gotinên jina xwe dibire û dixwaze baştir

têbigêhîje, ji nişka ve çavên wî tarî dibin, nola ko ji ciyekî bilind û bilind

gêrî valayiyekê bibe, dîsa verşiya wî tê, dîsa dewxa wî diçe, destê xwe davê-

je şevkirasê jina xwe û bi dengê nîvxeniqî dibê:

— Dilê min li hev dikeve... ez dikim bikevim, dewxa min... diçe...

Nêrgisa koçer bi tirs û bismîllah bi herdu destên wî digire, diguvişîne,

xwe di ser de xwar dike û dibêje:

— Baş xuyaye ko tu bi zengê ketiye... bihêle ez hinek şîr bînim.

Nêrgisa koçer hinek şîr tîne, di gewriya wî de bera jêr dide, bêyî ko bilive, bipeyive çavên wî li binê zikê xênî ye û her bi çavekî vala dinêre,

carina jina wî jê dipirse ka piçekî baş bû an ne, lê bersiv ji mamoste

122

Kevanot nayê, wê çaxê jî tirseke mezintir bi jina wî digire ko mêrê wê

rasterast nexweş e û nexweşiya wî jî giran e, ne zêde, tenê bi qasî nîv

saetekê li ber serê mêrê xwe weha rûniştî dimîne û dû re ev tirsê wê tê serê

wê, mêrê wê ji ber germiya laşê xwe dinale û pesta dibêje, Nêrgisa koçer

dibîne bê çi xwîdan li mêrê wê dide der û bêhna nexweşiyeke rastkîno jê

tê, ji bilî rûniştina li ber serê mêrê xwe tiştêkî din ji destê wê nayê û nizane

bê ew ê çî bike, carina pêşgîrê bi ava sar şil dike, dide ser eniya wî  
ya germ  
û hew, mamoste Kevanot di vê êş û agirê xwe de pesta dibêje, mîna  
ko zi-  
manê xwe bide nav diranên xwe biçû û wusa bipeyive, peyvikên ko  
ji de-  
vê wî derdikevin nayên famkirin, piştî gavekê xewxilmajiyekê digire  
ser  
nexweşê şevê, nalîna wî tê birîn, agirê wî piçekî dadikeve û êdî  
pesta jî  
nabêje, li ser vê yekê dilê jina wî Nêrgisa koçer hinekî pêt dibe, wê  
pêşgîra  
şil ji ser eniya wî radike, dide hêlekê û bi rewşeke bêxew xwe di paş  
pişta  
wî re dirêj dike.  
Bi nêzîkî destê sibê re, di rewşeke nîvxew û nîvşiyar de mamoste  
Kevanot dengê dibihîse, ev dibe şeva duduyan ko ev dengên nîvê  
şevan  
di guhên wî de diçingin, lê ev dengê îşevîn ne weke yê şeva çûyî ye,  
nabê-  
je: »Nêrgis, Nêrgis, Nêrgis!« û bi qasî vî dengê Siyabendê yekçav î  
cinî ne  
safî ye, ji derve jî nayê, ji quncikekî odê, ji binê balîva wî, ji hundurê  
wî  
bi xwe derdikeve û bi melodiya dengê nas dibê:  
»— Kevanotê min, ez dizanim bê anuha tu çiqasî nexweş î!« Ev  
dengê

ha guhên Kevanotê nexweş diçingîne, hiş û aqilê wî berhev dike û  
bi qasî  
bîst salan bi şûn de davêje, ev deng melodiya dengê dapîra wî ye,  
piştî bîst  
salên mirina dapîra xwe anuha cara pêşîn dengê wê dibihîze, bi vî  
dengê  
dapîra xwe re bi tirs û ricifîn çavên xwe nîvçe vedike, lampa êvarê  
hîn jî  
pêketî ye, ji ber siryaqê quncikê hember heta jêr mij û dûmaneke  
sipîçolkî bi ber çavên wî dikeve, pêşiyê ji çavên xwe dikeve gumanê  
û dibê  
qeyê ji ber kilîşik an jî lîlikên bêxewiyê ye, lê dema ko baş çavên xwe  
vedike û bi baldarî lê dinêre, dibîne ko rêşî an jî porekî dirêj î sipî ji  
ber  
siryaqê quncik heta jêr daketiye, carina ruyê pîrejineke paqij di nava  
wî  
porê sipî de xuya dibe, bi wî re dipişire, tiştina dibêje û dû re dîsa  
wenda  
dibe, mamoste Kevanot bi tirs û şika şevê di zimanê xwe de gez  
dike, êşa  
zimanê wî pê dide zanîn ko anuha ew payî ye, xwe bi xwe: »Wê çaxê  
ev  
deng û bergeha dapîra min rast e.« dibêje, ji bo ko baş bi vê yekê  
ewle be,  
destê xwe davêje milê jina xwe û dîsa şiyar dike, lê dema ko tev jina  
xwe  
di nava nivînan de ramedî berê xwe ber bi quncikê odê dike, ne  
dapîr û



ne jî ew porê sipî li wir e.

123

Mamoste Kevanot sipûsar û çavên wî beloqî dibin, bi tevgereke dudilî

û tirsdar li jina xwe dinêre:

— Anuha li wir bû, dibêje, dapîra min li wir bû...

Ji van gotinên mamoste Kevanot, jina wî diveniciqe, di dilê xwe de:

»Ev

mêrikê ha ê îşev dîn bibe!« dibêje û bi tirs lê vedigerîne:

— Li ber çavên te wusa bûye. Xuyaye tu îşev pir nexweş î...

Mamoste Kevanot destekî xwe ber bi jina xwe bilind dike, zûzûka got-

inên wê dibire û dibê:

— A wê jî... dapîra min jî mîna te got. Got:

»— Ez dizanim bê anuha tu çiqasî nexweş î!...« Min baş bihîst ko ji min

re wusa got. Peyvik bi peyvik... rasterast weha gote min:

»— Kevanotê min, ez dizanim bê anuha tu çiqasî nexweş î.«

Ji bo ko vê bêyomiya şevê ji dora mamoste Kevanot, ji malê û ji xwe dûrbixe, jina wî radibe di nava nivînên xwe de rûdine, destê xwe davêje

pêşgîra li kêleka balîva wî, dirêjî wî dike û dibê:

— De qeyê te xewn dîtiye, lo... ma...

— Xewna çî!... ma ez payî bûm, dibêjim... Min bi çavên xwe jî dît...

Bi van gotinên xwe re mamoste Kevanot bi tirs, bi şikebarî li dora xwe,

li jina xwe, li binê zikê xênî, li her aliyê dinêre, çavên wî beloq û gwînê wî

zer dibe, ji nişka ve destê xwe ber bi dîwarê hember radike, didomîne û:

— Binêre, dibêje, ma tu nabînî? Ma tu dapîra min nabînî? Dapîrrr!...

Destê mamoste Kevanot ber bi dîwarê hember rakirî, li dapîra xwe diqîre, jina wî bi girîyekî ji tirsê xwe davêje ser wî û dike kûrînî, mamoste

Kevanot dike ko rabe ser xwe û ber bi dîwêr, ber bi dapîra xwe biçê, jina

wî bi zikê xwe î werimî xwe bi dest û piyê wî ve darde dike, bi girî, bi

hewar, bi bergerîn û hustuxwar dibêje:

— Tişteke tune... ez bi heyran!... li ber çavên te... welle tişteke tune, li min hewarê... bavo! Ev çi bû îşev hate serê me rebenên Xwedê!...

Mamoste Kevanot xwe ji destê jina xwe difilitîne, li ber quncikê herdu

dîwarê hember nola ko bixwaze ji jor tûrekî an jî tişteke daxîne, herdu

destên xwe hinekî ber bi jor radike, bi giramî, bi bêrî, bi girî bala xwe dide

jora quncik û dibê:

— Ez bi qurban, dapîr! Ma tu dizanî bê ev bûn çend sal?... De ka ji min

re!...

Nêrgisa koçer ji dîwêr, ji mamoste Kevanot dûr li ser nivînan xwe de-

verû havêtiye, destên xwe dane ser guhên xwe û bi tirs digirî, bi tirs ko

mêrê wê dîn bûye, bi tirs ko ev şeva ha ê kengî li wan zelal bibe, bi tir-

124

sa ko bi zarok nexweş e û ew vê tirs xwe ya dawîn anuha ji devê mêrê

xwe jî dibîhize, mamoste Kevanot hîn weke berê li ber quncik e û bi dengê nîvxeniqî dibêje:

— Na, dapîr, na... nebêje!... ev bûn çend salên me ko... em li bendî vê

rojê bûn... roja ko... Ko zarokek ê ji me re çêbibûya, dapîr!

Bi peyva zarok re, bêyî daxwaza Nêrgisa koçer serê wê ji nivînan bilind

dibe, li mêrê xwe dinêre, a di vê gavê de mamoste Kevanot li xwe divar-

qile, bergeha dapîra wî ji ber çavên wî wenda dibe, bi şermesari, bi gunehkari li awurên jina xwe dinêre û ber bi nivînen xwe diçe, bêyî ko

peyveke piçûk jî ji jina xwe re bike, lihêfê di ser serê xwe de diqelibîne û

di nava nivînan de dikeve tayê, mîna çûçikê ko ji dafê bifilite bi serekî

nîvgêj û nîvzelal yek bi yek van hemû bûyerên îşevîn tîne bîra xwe, her ko

ew wan tiştan tîne bîra xwe di binê lihêfê de bêtir diricife, jina wî li ser

nivînan li kêleka wî rûniştiye, serê xwe daye ser çogên xwe, bi tirs,  
bi  
dilekî bêhêvî li mêrê xwe î nixumandî dinêre û êdî xew nakeve  
çavan.  
Ronahiya destpêka roja nû bi tariya îşevîn re dikeve qayişê, di  
dawiya  
dawîn de bi ser dikeve û dunya rohnî dibe, ji çend aliyên cuda cuda  
dengê  
dîkan bilind dibe, gelek nabuhure dengên şênîyên gund li ser kaniyê  
û di  
riya kêleka dibistanê de tê bihîstin, weke rojên hertimî rojêke din jî  
li  
gund û şênîyan hiltê, zarokên xwendekar li hewşa dibistanê berhev  
dib-  
in, lê mamostê wan tune, di nivînan de bi jina xwe dide zanîn ko  
ew  
nexweş e û nikane rabe, jina wî diçe bi zarokan dide zanîn ko  
mamostê  
wan pir nexweş e û wan dişîne malê, zarok li gund belav dibin û bi  
şênîyan didine zanîn ko mamostê wan pir û pir nexweş e. Ev cara  
pêşîn e  
ko zarok ji ber nexweşiya vî mamostê xwe nakevin dersxanê.  
Ro bilind dibe û xwe dide ber taştiya, jina mamostê nexweş wî di  
nava  
nivînan de dihêle û weke hertim serjêrî gund dibe, lê vê carê bi tirs,  
bi ner-  
ihetî û bi hustuxwarî ye, li hewşa mala Xanê bi dilşewatiya bêkesekê  
xwe

davêje ser û digirî, bi giriyê xwe re li wir yek bi yek hertiştî jê re vedike, dû

re li gotinên xwe zêde dike û dibêje:

— A ev du şevên dawîn... ev du şevên Xwedê ne ko tiştên weha kam-

bax têne serê min rebenê, metê.

Metê ji van gotinên Nêrgisa koçer têdigêhîje ko mêrê wê pir nexweş e,

loma zûzûka xwe radipêçe, bi racemî wê dikeve û bi hev re ji hewşa mala

Xanê derdikevin, li ser riya xwe vedigerin mala Sêvdînê Selîm, nexweşiya

mamoste Kevanot pê didine zanîn û wî jî bi xwe re dibin, dema ko ji dûr

ve çav li mamoste Kevanot dikevin, Sêvdînê Selîm bi tevgera mezinekî ko

125

mizgînên baş û xweşiyê bi merivan dide zanîn, dibê:

— Na, na... ne weke ko hûn dibêjin... şikir ji Xwedê re, ji xwe re li ber

tavê rûniştiye.

Li beroşkê pêşiya lojmana dibistanê, li ber dîwarê jêrîn mamoste Kevanot rûniştiye, bi qasî mîtroyekê ji ber lingên xwe dûr, li pêşiya xwe

li tişteki çavên xwe aliqandine û bi ramanên giran diponije, dilê Nêrgisa

koçer xweş dibe ko mêrê wê ji nava nivînan rabûye, ji bo ko zêde  
bala wî  
neyê kişandin, ew û Xanê di hêla paşîn re bi pêlikên lojmanê ve  
hildikişin  
û derbasî hundur dibin, Sêvdînê Selîm jî bi silav û tevgerên hertimî  
heta  
pêş mamoste Kevanot diçe û dibê:  
— Dinêrim ko beroşkê payîzî li te hatiye, xoce efendî!  
Lê ne haya xoce efendî ji hatina Sêvdînê Selîm û ne jî ji bergeha  
hawur-  
dor heye, silava ko tê dayînê jî bê bersiv dimîne û ji ber vê yekê  
Sêvdînê  
Selîm dikeve gumanekê, gumana giraniya nexweşiya mamoste  
Kevanot,  
bi şikebarî, bi dudilî diçe li pêş wî rûdine, li rewşa wî, li nexweşiya  
wî  
dipirse, lê ew her li wî ciyê berê dinêre û Xwedê dizane bê anuha di  
ra-  
manên xwe de li kuderê ye, gwînê wî zer û vemirî ye, hundurê çavên  
wî  
zuwa û bi awurên vala ye, laşê wî sist û bêxwîn dixuye, Sêvdînê  
Selîm  
wusa têdigêhîje ko mamoste Kevanot bi zerikê ketiye, ji bo rewş û  
nexweşên weha bi xwe bihîstiye û gelek caran bi çavên xwe jî dîtiye,  
dîtiye  
ko merivekî bi zerikê bikeve divê bi awayekî li xwe bivarqile, loma  
ew jî

di wê gavê de awayekî peyda dike, ji nişka ve destê xwe radike û bi tîn

sîlekê li binê guhê mamoste Kevanot dixê, bi şîrpîna vê sîla wî re çavên

mamoste Kevanot tarî dibin, di nav wê tariyê de çîkên rengîn ji ber çavên

wî diçin, ji ciyê xwe dipengize û li erdê dikeve, dilerize, diricife, diqepije.

Sêvdînê Selîm gopalê di destê xwe î çepê de berdide, bi herdu destan

dikemişe ser mamoste Kevanot ko bi dest û piyê wî bigire, vî bayê bêyom

ji ser rake, lê di dawiya dawîn de têdigêhîje ko ew bi tena serê xwe nikane,

lewra mamoste Kevanot li erdê qoçalî ser hev dibe, bêhn lê diçike, di reş

û mor de dixeniqe, çavên wî ji ciyên xwe dixericin çep û rast, dengekî

nîvxeniqî ji gewriya wî derdikeve der û kef bi devê wî dikeve.

— Xanêêê!... zû pîvaz!...

Ev dengê Sêvdînê Selîm weke hewara birîndarekî bilind dibe û heta hundurê lojmanê diçe, Xanê û Nêrgisa koçer zûzûka xwe digêhînin ber

pencerê, vê bergehê dibînin, Xanê pêşiyê vedigere ser Nêrgisa koçer:

— Zû pîvazekê bîne! dibêje û ber bi der dibeze, Nêrgisa koçer sipûsar

dibe, çogên wê sist dibin, dewxa wê diçe û mîna ko dergûşa di zikê  
xwe

126

de biparêze, destên xwe dide binê zikê xwe î gir, ber bi selika  
pîvazan diçe,

vedigere û ew jî li pey Xanê dilezîne, li hêla der, li ber dîwêr pîvazê  
dirêjî

Sêvdînê Selîm dike û ew jî dixwaze weke wan bi devereke mamoste  
Kevanot bigire û alîkariya wan bike.

Sêvdînê Selîm pîvazê di binê lingê xwe de dipelixîne, felqekî digire  
destê xwe û dide ber pozê mamoste Kevanot, bi ufîn û fişkefişk  
mamoste

Kevanot xwe li hev qoçalî dike, dest û pî lê dibine weke dar û dijene,  
Xanê

dizivire ser Nêrgisa koçer û pê dide zanîn ko xwe jê dûrxîne, zikê  
xwe ji

dest û lingê wî yên jenende biparêze, Nêrgisa koçer bi tirs, bi dudilî  
radibe, xwe jê vedikişîne û digirî.

Bi bêhna pîvazê re dest û pî li mamoste Kevanot sist dibin, fişkefişka  
wî

tê birîn, mîna ko gewriya wî ji nû ve vebe, hilma xwe digire, berdide,  
dû

re bi bêhngirtineke dirêj re tê ser xwe û çavên xwe vedike, pêşiyê li  
asi-

manê hêşîn çend telpên ewrê sipî bi ber çavên wî dikeve, dema  
têdigêhî-



je ko li derve, li ber dîwarê lojmanê serê wî li ser çoga Xanê ye, jina  
wî û

Sêvdînê Selîm di ser re sekinîne, bêyî ko baş bizani be ka çi bûye,  
dilê xwe

bi xwe dişewitîne û nola zarokê digirî.

Bi êvarê re ev bûyera ha di mal û kuçên gund de, di devê şêniyan  
de

dibe benîşt û dibêjin:

»— Ji me çêtir, bi ber bayê wan pîrozweran ketiye.«

»— Ji me çêtir, bi cinan ketiye.«

»— Bi hepûlepê ketiye.«

»— Dîn bûye.«

»— Ev tişt ji nişka ve bûye û...«

Xêrxwaz û dilşewatên mamoste Kevanot, sofî û feqiyên gund dikişin  
lojmana dibistanê, li dora wî rûdinin, li rewşa wî dipirsin û dostaniya  
xwe

pêşan didin, mamoste Kevanot bi şermesarî, bi tirs û bi dudilî ji  
civata

dora xwe re çêlî bûyerên şeva çûyî dike û bi wan dide zanîn ko  
dapîra wî

bi kincên sipîçolkî hatiye, li wî quncikê hundur xwe bi ber çavên wî  
xis-

tiye û giraniya nexweşiya wî pê daye zanîn.

Mîna ko ji berê de hay ji van tiştan hebe, feqî Dimso bi tevgereke  
zana

ji mamoste Kevanot re şirove dike û dibê:

— Ev yeka ha baş dide xuyakirin ko tu merivekî ji Xwedê re î, xoce...

loma bi te ve xuya bûye... û ev ruhên pîrozwer xwe rayê herkesê jî nadin.

Mamoste Kevanot hêdîka serê xwe ber bi quncikê odê radike, bi tirs, bi

nerihetî û bi dengê nizam:

— Tiştêkî din jî bi min da zanîn, Xwedêyo!... dibêje, serê xwe dixê ber

127

xwe, bi herdu destan nola jinên diltenik porê xwe dikişîne û bi kelagirî

didomîne: Ji min re got:

»— Dergûşa we ê... ruyê dunyayê nebîne!...«

Diya dergûşa wan ji hêla jêrîn ji ber semawera çayê radibe, destên xwe

dide ser zikê xwe û derbasî paş deriyê oda hember dibe, dilê civata dorê bi

vê mala mamoste Kevanot dişewite, bê peyv û bê gotin li hev dinêrin, lê

feqî Dimso vê carê herdu destên xwe jî ber bi mamoste Kevanot vedigire

û dibêje:

— Dilê xwe pêt bigire, xoce. Dilê xwe teng neke. Mirin... mirin û mayîna dergûşa we jî êdî di destê Xwedê de ye. Xwedê bi ya xwe dike.

Xwedê bi ya xwe dike, feqî Dimso jî bi gotina civata dorê dike, perçên

ko ji pirtûka pîrozwer, ji devên seydayên mezin ji ber kirine, bi  
nepixîna  
oldarekî rastkîno wan dixwîne û pifî ser mamoste Kevanot dike, dû  
re  
radibe ser xwe û bi pilepil, bi xwendin di ser dîwaran de tiştina dibê  
û  
diqîre, pifî quncikên hêla hundur, pifî siryaqan, pifî aliyê caxên  
nivînan  
dike, di dawiya dawîn de jî kaxezeke sipî dixwaze, bi pênuşekê reş  
dike,  
weke nivîşteke sêgoşe li hev pan dike, di ber ruyê balîva mamoste  
Kevanot de dike xwarê û dibêje:  
— A anuha bê xem û bê tirs rakeve.  
Di ser vê nivîştê re şênîyên gund bê xem û bê tirs heta derengî şevê  
jî li  
dora wî titûnê dikêşin, çayê vedixwin, dikevîne galegalên oldariyê,  
çêlî  
başî û nebaşîya van ruhên pîrozwer dikin, mîna tawanbarekî ko bi  
gunehkariya xwe jî nizane mamoste Kevanot bêdeng guhdariya  
dora xwe  
dike, diponije, diqirçile, heta ko civata îşevîn radibin û li malên xwe  
belav  
jî dibin, ew her wekî xwe ye.  
Mîna ko bixwazin hertiştî ji bîr bikin, wê şevê di nava nivînan de ew  
û  
jina xwe nêzîkî hev dibin, li hev dipiçikin, nola ko piçûk î di zikê jina  
xwe

de ji nebaşiyên dûr û nêzîkî aqilan biparêze mamoste Kevanot destê  
xwe  
li zikê kewaniya xwe dipelîne, mist dide û di dawiya dawîn de li jor  
li ser  
navika wê disekinîne û herdu jî di bêdengiya şevê de dikevîne xew.  
Dema ko ro li wan bilind dibe, mamoste Kevanot vê şeva bêxewn û  
bê-  
deng dide xatirê wê nivîştê, nivîştî ko feqî Dimso di ber ruyê balîva  
wî re  
kiriye, Nêrgisa koçer di dilê xwe de bangî Xwedê dike ko ev şeva ha  
bê tirs  
û bê qêrîn di ser wan de derbas bû.  
Lê heta çend rojên dû re jî xweş diyar dibe ko tirs û gelek pirsên  
bêber-  
siv şopên xwe li mala mamoste Kevanot kwîr vedane.  
128

Ji van rojên kambax rojekê li ser taştê ji nişka ve tiştêkî nola êşeke  
tîndar  
xwe li zikê Nêrgisa koçer dide der û li piştî wê giran dibe, ne tenê  
giraniya  
yekî, mîna ko giraniya deh zarokan ketiye tûrekî şil û benê wî tûrî jî  
ji hêla  
hundur de bi movikên piştî wê ve hatiye girêdan, ewqas giran e,  
hundurê  
wê dişewite, tîr dike û dêşe, Nêrgisa koçer ji ser taştê radibe,  
destekî xwe

davêje pişta xwe û destê din jî dide binê zikê xwe î gir, dikişer ser nivînan

û li wir diqepije, mamoste Kevanot dibeze ber pencerê û li hewşa dibis-

tanê dinêre, hustuyê xwe ber bi zarokê xwendekarê dibistanê dirêj dike

û ji wir bi dengê tevlihev lê diqîre:

- Ero, Demo, Demo!... zû bibeze mala meta Xanê... bila tew nesekine

û zû were... lez bike, lez, lez!...«

Demo ber bi mala meta Xanê dilezîne, mamoste Kevanot diçe ber jina

xwe ya ramedî û bêyî ko bizane meriv di demên weha de çi dike, destê

xwe li zikê û çîpên jina xwe dipelîne, şeltikeke piçûk tîne û di binê jina xwe

re radixîne, avexwîneke bêwext ji jinikê dirije û li vê şeltika piçûk belav

dibe.

Entîn û ofîna jina mamoste Kevanot destê û lingên wî li hev digerîne û

nizane bê ew ê çi bike, gelek nabuhure bi hilkehilka bazdanê Xanê dikeve

hundur, bi vê hatina wê re Nêrgisa koçer dilê xwe bi xwe dişewitîne û bi

kelagirî dibêje:

— Ez... ez mirim, metê!..

— Metê bi qurban!... xeman nexwe, netirse... ez va hatim.

Metê berê berê diçe xwe di ser Nêrgisa koçer de vedigire, ruyê wê  
maç  
dike û bi pêşa fîstanê xwe xwîdana li eniya wê paqij dike, derpê wê  
dişe-  
qitîne, daxwaza meqeseke paqij dike, mamoste Kevanot meqeseke  
paqij  
tîne, şerm dike, bi dilpekiya ko ew ê anuha bibe bav ber bi pencerê  
diçe,  
çavên wî li der û guhên wî li hundur e, bi qasî kişandina cixareyekê  
entîn,  
nalîn û peyvikên bergerê dibihîse, di vê navberê de qêrîna êşekê di  
guhên  
wî de diçinge, Xanê serê zarokê ji binê jina wî dikêşe û bi  
melodiyeke  
oldarî Allah û Ekber'ekê di guhê zarok de diqîre, tev semboleke  
mêranîyê  
laşekî piçûk derdikeve lê bersiva van herdu peyvikên mezin nade,  
Xanê  
wî di nava lepên xwe de dibe û tîne lê zarok naqîje, Xanê bi destekî  
xwe

129

herdu lingên wî digire û serjêr radike lê zarok nagirî, Xanê bi destê  
din  
pişta wî ditepîne lê zarok bêdeng e, tev xwîn û navikê Xanê wî  
disipêre  
ciyê berê lê zarok nalive, bêyî ko navika zarok bibire Xanê wî li ser  
şeltikê

dirêj dike, sîngê wî mist dide, dişidîne lê zarok bêhnçikiyayî ye, Xanê de-

vê xwe dixê devê laşê piçûk û pifî hêla hundur dike lê zarok sar e, zarok miriye.

Wê rojê zarok dişon, dipêçin û di goristana Mekanê Mala Dînan de dikine erdê, ne tenê ji bo mirina zarokê wan, ji bo van hemû bêyomiyên

ko di van rojên dawîn de hatine serê mala mamoste Kevanot, tev jin û

mêran şênîyên gund ber bi lojmana dibistanê dikişin, li gor berbora gundîtiyê destên alîkariyê dirêjî rewş û nexweşa malê dikin, sersaxiyê lê

dikin, dixwazin tirs û xemgîniyê li ber wan belav bikin.

Ev sê sal in ko mamoste Kevanot û jina xwe li bendî rojeke weha ne, ro-

ja ko zarokek ê ji wan re bibe, gerçê mamoste Kevanot hîn jî pê nizane, pê

nizane ko jina wî heta heft mehan beriya nuha jî bi pêşniyarên jinên gund

şilkî çêkirine û li ser goristana Mekanê Mala Dînan li zarokan belav kirine, li wir di binê siya dara pîrozwer de xwe dirêj kiriye, bangî ruhê

pîrozwer, bangî ruhê Sofî Dîno kiriye û ji Xwedê xwestiye ko bi zarok nexweş bibe, lê bi çî awayî dibe bila bibe, di roja îroyîn de li ser bûyîn û

mirina vî zarokê ha, ji xemgîniyê bêtir gelek tiştên wekîdin di serê

mamoste Kevanot de diçin û tîn, gelekî dide ber hev û dide ser hev,  
li ser  
sedemên ciyê ciyê disekine, carina di dilê xwe de serwext dibe û:  
»Divê ji  
bo herkesî wusa be, zarokê pêşîn hertim çetin e û bi qasî du mehan  
jî  
beriya wexta xwe bû, loma... loma mir.« dibêje, carina jî xwe wekî  
sedemê  
vê mirina zarok dibîne û nola gunehkarekî mezin di dilê xwe de: »Ji  
ber  
van bêyomiyên çend rojên dawîn, tirs li rebena jina min çêbû û  
loma  
zarok ji ber çû.« dibêje, lê di dawiya dawîn de mamoste Kevanot  
pirtir li  
ser gotina dapîra xwe disekine, dapîra ko mirina zarok bi wî dabû  
zanîn  
û jê re goti bû:  
»— Dergûşa we ê ruyê dunyayê nebîne.«  
Ew rewş û bûyerên van rojên dawîn: ew şeva dilverşîn, ew deng û  
ew  
gotinên dapîra wî, ev mirina zarokê wan, ev hemû tiştên ha  
mamoste  
Kevanot dikişîne nav mijara ol û oldariyê ko lê hûr bibe, bi xwe  
bibîne û  
bi xwe têbigêhîje.

130

Heta nuha jî mijara teolojiyê bi qasî îro bala mamoste Kevanot ne



kişandiyê, weke gelek kesan wî jî hebûna hêzeke bi navê yezdanê diloan,  
bi navê Xwedê di dereke serê xwe de bi cî kiriye, di felsefa ola Zerdeştî de  
başiya Ahûra Mazda û xirabiya Angra Manyû bihîstiyê, bihîstiyê ko Bûda di şîretên xwe de ji şagirtên xwe re: »Hûn bi xwe ji xwe re bibine ronahî.« gotiyê, ji nêzîk ve dîtiyê ko bi hezaran, bi mîlyonan merivan dane ser riya ola mesîhî, di rûpelên rojane de weke bûyerên rojê şer û kuştinên ji bo ol û pêxemberê herî dawîn xwendiyê û hew.  
Lê ji vê rojê û şûn de li vî gundî bi vê rewş û nerihetiyê xwe mamoste Kevanot cara duduyan tê guhertin, weke teologekî dikeve lêgerîneke li van ruhên pîrozwer, piştî demeke dirêj cara pêşîn û dû re jî çend carên mîna vê cara pêşîn bi daxwazeke jidil berê xwe dide bajêr, ji zana û oldaran dipirse, bi dilpekî guhdariya wan dike, bi pey pirtûkên oldariyê dikeve û li wir, li bajêr dikeve nava refikên pirtûkxanên kevin, di demeke kurt de werger, şirove û dîtinên li ser pirtûkên mezin peyda dike, di rûpelên van pirtûkên pîrozwer de rastî mijarên cinan, bi zimanê van gundiyan rastî aferîdên ji me çêtir tê, van beşan bi baldarî dixwîne û tê de dibîne ko ev aferîdên weha tew jî ji me ne çêtir in, car bi car vedigere serî

û van beşên pirtûkên pîrozwer ji nû ve dixwîne, dixwîne û di van  
beşan  
de, di van rûpelan de dibîne ko di destpêkê de Xwedê bi tenê ye, dû  
re li  
gor dilê xwe bi sed hezaran kerûbiyên şîrşêrîn û dilovan diafirîne,  
paşîngê  
gerdûneke tarî û vala li dar dixe, daxwaza ronahiyekê dike, bîst û  
çar  
saetên vê tarî û vê ronahiyê li ber hev berdêl dike û bi navê,  
Roja yekem dinavîne,  
Roja duduyan navberekê dixe navîna av û asimanan,  
Roja sisiyan av û reşayiyê ji hev vediqetîne û ji her babetî tovên dar  
û  
giyan li reşayiyê direşîne,  
Roja çaran vê av û vê reşayiya dunyayê bi ronahiya ro, hêv û  
histêrikên  
asimanî dixemilîne,  
Roja pêncan ji her babetî heywanan bi ruyê av û reşayiyê dixîne,  
Roja şeşan dirame ko ji xwe re ji axê merivekî dunyayî çêke û wusa  
jî  
dike,  
131

Ji axê pêşiyê mêrekî û dû re jî ji parxwanê wî jinekê çêdike, navê  
Adem  
û Hewayê li wan dike.  
Li hemberî vê hunermendiya Xwedê, jîrtirîn, xurtirîn, baqiltirîn

melekê wî, Melekê Tawûs çavnebar dibe, bi Xwedê re dikeve  
qayîşê,  
Hewayê dixapîne û pê Adem ji rê derdixîne, Xwedê ji vê yekê hêrs  
dibe,  
pêşiyê naletê li Melekê Tawûs dibarîne û wî bi rengdêra Şeytan  
dinavîne,  
dû re Adem û Hewayê diarihîne, zarokan bi pey wan dixîne, keçên  
xweşik û jinên barîk ji van zarokên wan derdikevin, li hemberî  
xweşikiya  
van keç û jinên ademî doxîn li melekên asimanî sist dibe, weke  
mêran ji  
jor de ji asimanan dadikevin ruyê erdê, bi keç û jinên ademî re li ba  
dikevin, bi wan re radikevin, zarokên ko ji wan çêdibin bejnên wan  
bilind, serên wan gir û aferîdên seyr ji wan derdikevin.  
Xwedê ji vê tevgera melekên xwe yên doxînsist jî hêrs dibe, pê dêşe,  
weke niviskarekî ko ji berhemeke xwe ya çapbûyî ne kêfxweş be  
Xwedê jî  
ji vê hunera xwe poşman dibe û şerm dike, ewqas şerm dike û  
ewqas  
poşman dibe ku!... weke gelek hunermendên ko dû re agir bera  
berhemên xwe didin Xwedê jî ji bilî malbata Nûh tevayiyê vê  
berhema  
xwe av û agir dike, van melekên xwe yên doxînsist dikişîne  
asimanan, li  
wir wan tawanbar dike, mîna ko bibêje: de biçin û weke xwe bikin,  
bi  
derew û tevgerên xwe yên qirêj dijminiya min bikin, Xwedê wan ji  
asi-

manan de serjêr davêje xwarê.

A ji wê wextê û vir de ye ko ev aferîdên ha xwe dane aliyê qayîşkêşê Xwedê, Şeytanê Mezin, bi giyan û mejiyê ademiyan ketine, derewan li

hev tînin, tovên nebaşiyê di nava merivan de direşînin, merivan berdidin

pêşîrên hev û ji ser riya rast didine alî, dema ko bi van nebaşiyên xwe jî têr

nabin, radibin jîrî û zaniyariya xwe bi kar tînin, xwe dikin dewsa merivên

mirî, bi hunermendî dikevin tevgerên wan, dengên wan bi lêv dikin, bi

vî awayî pêşiyê dudilîyekê û paşîngê jî tirsekê li merivan çêdikin, ziman li

merivan girêdidin, merivan kwîr û bawî dikin, pêşniyarên kuştin û xwekuştinê davêjin ber merivan, merivan dîn dikin û bi çolan dixin.

Mamoste Kevanot van hemû tiştên ha car bi car ji pirtûkên pîrozwer dixwîne, dixwîne û di dawîya dawîn de serwextî tişteki dibe, serwext dibe

ku: ev aferîdên ha ji me ne çêtir in, ji kesekî jî ne çêtir in, ev yên ha melekên arihandî, melekên gunehkar in, layengirên Şeytên û dijminên

ademiyan in, devên newalan, şikeftên tarî û qulên pixêriyan cî û warên

wan in, weke cin, pîrebok û netekin derdikevin pêşiya merivan, ji ber

jîriya xwe dikanin xwe têxin dewsa herkesî û weke herkesî bipeyivin,

dikanin merivan bêşînin, bilikumînin, bixînin û kula mirinê di laşê merivan de biçînin.

Piştî xwendin û têgêhîştina van hemû tiştên ha, gelek carên din jî ew

dapîra mamoste Kevanot di nîvê şevan de tê û xwe rayê wî dide, bi wî re

dipeyive, li rewşa wî dipirse, mizgîniyên baş an jî gotinên reş jê re bi lêv

dike, di her carên weha de tirs û hêrs li mamoste Kevanot tîrtir dibe, di

şevên nîvên şevan de ji xewxilmajiyên divenciqe û di her careke weha de

jî mîna hezretî Îsa: »Dûr biçe, Şeytan!« dibêje û li wê diqîre, lê pere nake,

ew dûr naçe, bi vê qêrîna wî re kenekî ji van kenên pîrên cadûkar hişk û

zuwa di guhên mamoste Kevanot de olan dide, wê çaxê jî radibe ser xwe,

bi hêrs û dengê bilind: »Te dergûşê me jî ji me girt, keça Şeytên!« dibê-

je, dîwaran pîn û kurmik dike, tufî pencerê dike, di wê hêrs û tirsê de dîsa

dikeve, dîsa dilerize, dîsa zimanê xwe dicû, dîsa av û kef bi devê wî dikeve

û dîsa qoçalî ser hev dibe.

Di her ketineke weha de kesên ko xwe pêşiyê digêhînin vê hewara

mamoste Kevanot, beriya hertiştî dest û çavên xwe li peydakirina  
pî-  
vazekê digerinîn, wê pîvazê dipelixinîn û didin ber pozê wî, dû re  
seyda û  
feqiyên gund lê dicivin û ilmê oldariya xwe bi kar tînin, pirtûkên  
pîroz-  
er li ber serê wî vedikin û ayetên cinan di guhên wî de dixwînin,  
zimanê  
Xwedê li kaxezan siwar dikin û weke nivîst û bazbendan pê ve  
dizeliqînin, bi benên rengîn berbejn û hemêliyan bi hustuyê wî ve  
dikin.  
Ji bo ko mamoste Kevanot ji nava van lepên bêyom bifilite, çi ji  
destên  
şênîyên gund tê ew dikin, lê ev ked û ev karên wan jî pere nake, roj  
bi roj  
mamoste Kevanot xirabtir dibe, êdî wusa dibe ko ne tenê di tariyên  
şevên  
nîvê şevan de, herweha bi ro jî û li ber çavên herkesî jî dikeve, bi  
gotineke  
din gelek pîvazên din têne pelixandin, nivîstên xurtir, bazbendên  
kesktir,  
berbejn û hemêliyên nûtir bi mamoste Kevanot ve dibin, di nava  
şênîyên  
gund de li ser vê ketina wî şirovên cuda cuda belav dibin: »Ji me  
çêtir  
cinên wî lê qert bûne û êdî pirtûka pîrozwer jî nikane bandorekê lê  
bike!«

dibêjin, navê mamoste Kevanot di devê piçûk û mezinên şêniyên gund

de dibe ziman, dirêj û zêde dikin, dinepixînin, giran dikin û ténagêhîjin:

»Di vî gundî de jî gelek kes bi ber bayê wan aferîdên ji me çêtir ketin, lê

ne bi vî rengê ha!« dibêjin.

Mamoste Kevanot bi xwe û ramanê xwe de ketiye, van gotin û şirovên

şêniyên gund nabîhise, ji nava gund vedikişe lojmana xwe, danûsitend-

inên xwe û gundiyan radike, mîna yekî sondxwarî ji hewşa dibistanê der-

nakeve der, weke xwî an jî nexweşiyê kevin carina bi zarokan re dikeve

133

dersxanê, bêyî ko tiştekî bide ber zarokan li ser masa xwe rûdine, bi ra-

man, bi çavên gir û vala temaşa wan dike, di van rojên dawîn de, bi navê

dersê an jî di dewsa dersê de hertim pirsekê ji wan dike û: »Hûn dixwazin

bibin çi?« dibêje, îro û anuha jî beriya ko zarokan ji dibistanê berde nava

malan, dixwaze dîsa vê pirsê xwe bike, lê bi mamoste Kevanot wusa tê ko

anuha yek bi yek hemû zarok bersiva vê pirsas wî didin û pê didine zanîn

ku: ew dixwazin bibin nîşandarên çûçikan, çîrokbêjên çîrokên cin û periyan, dixwazin bibin seyda û meleyên xurt ko devê gur û maran girêdin, cinan ji ser kesên cînî rakin, dixwazin ilm û zimanekî wusa bi kar

bînin ko ce û genim bi dîwaran ve hilkişînin, wekîdin... û wekîdin jî dixwazin bibin xwediyên vatiniya gelek tiştên weke van tiştan.

Di wê gavê de dilê mamoste Kevanot pê dide zanîn û jê re dibê: »Ev zarokên ha zarokên cin û şeytanan in.« û ne tenê dilê wî herweha ew bi

çavên xwe jî dibîne, dibîne ko destên wan, serê wan, diranên wan, dev û

pozên wan, guhên wan, bi gotineke din tevayiyê bergeha van zarokên ha

bi aliyên xeternak têne ber çavên wî, bêdengiyeke hertimî li ber masê di-

gire ser mamoste Kevanot, serê wî vala, çavên wî zîq û laşê wî pûç dibe,

bi qasî qirş û pûşekî sivik dibe: av were li ser ba were li ber e... û belê, di

vê rewşê de û anuha ji nişka ve çavên wî di reş ve diçin, ricifiyeke bêmane

xwe lê dide der, gêrî valayiyêke ripûreş dibe, li erdekî tirs û tarî dikeve,

çîkên rengîn ji ber çavên wî diçin û di ronahiya wan çîkan de bi çavên serê



xwe jî dibîne, mamoste Kevanot dibîne ko bi devên xwar, diranên  
bîç û  
pozên pelixî aferîdên seyr û kambax li dora wî direqisin, destên xwe  
di  
laşên hev de dikin û ji hev goşt dixwin, dû re... û dû re jî ev aferîdên  
ha bi  
kambaxî vedigerine ser wî, nînog û tiliyên xwe di çavên wî re dikin  
ko  
derxînin, destên xwe davêjine gewriya wî ko bifetisînin.  
Mamoste Kevanot ji ser sandaliya xwe gêrî xwarê bûye, li erdê li ber  
masa xwe diricife, dilerize, diranên wî di ser hev re dikine qîrçeqîrç,  
dest  
û ling lê dibine dar, serê xwe li ba dike, gwînê wî wusa reş dixeniqe  
ko  
meriv dibê qeyê ew hemû xwîna di laşê wî de hatiye li serçavê wî  
berhev  
bûye û ew ê anuha di çavên wî re bipijiqe der, ufeufa wî ye û bi  
dijwarî  
bêhna xwe vedide.  
Bi ketina mamoste Kevanot re xwendekarên piçûk ji dersxanê  
dibezine  
der, ber bi gund dilezînin û li kuçan belav dibin, vê rewşa mamostê  
xwe  
digêhînin şênîyên gund û bi wan didine zanîn, ji kuçan, ji hewşan, ji  
malan hewarê berhev dikin û ber bi lojmanê dişînin.  
Dema ko mamoste Kevanot çavên xwe vedike, dibîne ko Sêvdînê

Selîm, Guziyê dîn, feqî Dimso, Siyabendê yekçav î cinî di hewara wî  
de  
hatine û weke hemû carên berê vê carê jî jina wî li wir e, mamoste  
Kevanot radikin, kincên wî dawdişînin, derdixin der, li beroşkê hêla  
der  
li ber dîwarê lojmanê li hev rûdinin, heta ko jina wî çayekê germ  
dike û  
tîne li ber wan datîne jî mamoste Kevanot dengê xwe nake, mîna  
ko ji  
tiştêkî şerm bike serê wî di ber de ye û dirame, ne yek û ne dudu...  
dibe  
ko anuha li ser du hezar û du tiştan dirame. Di danîna çayên wan de  
ev  
rewşa wî dilê jina wî tenik dike û di wî dilê xwe î tenik de dibê: »Ev  
çi rewş  
e, Xwedê!... ew ê serî carê bikeve, ev gundiyên ha ê bikemişin ser û  
ji erdê  
rakin!«  
Gundiyên ko anuha kemişîn ser û ew ji erdê rakirin, bi firefir çayê  
vedixwin, dipeyivin, Sêvdînê Selîm bi mamoste Kevanot dide zanîn  
ko  
bêhna xwe teng neke, Xwedê mezin e, ew ê rojekê lê were  
dilovaniyê,  
Siyabendê yekçav î cinî quma dawîn li çaya xwe dixê, piyala vala  
datîne  
ber xwe, herdu destên xwe li sîngê xwe dixê û dibê:  
— Ma min... min ji destên wan çêtiran çi ne kişand ku!... hîn jî... ez  
hîn

jî dikişînim. Lê şikir ji Xwedê re ne mîna berê ye... tenê carina xewên  
şe-

van li min diherimînin û hew... pirî caran dernakevin pêşiya...

Feqî Dimso destê xwe ber bi Siyabendê yekçav î cinî radike, peyva  
wî

dibire, çav lê dişikîne û dibêje:

— Ji bona Xwedê çêlî wan neke, dema ko meriv çêlî wan dikin, ew  
jî

nêzîktir dibin. Çi dibe bila bibe, Xwedê mezin e, ew dizane, ew  
dikane û

ew dibîne.

Mamoste Kevanot jî dibîne, dibîne bê çawa feqî Dimso çavên xwe li  
yên dora xwe dişikîne, dizane ko ev tevgera wan wî piçûk dixîne, wî  
nexweş dixîne û bi çavên ciniyekî li wî dinêrin, lê mamoste Kevanot  
tişteki nikane, nikane bibêje çê an jî xirab tişteki weha, tişteki bi  
navê

cinan tune, lewra ew bi çavên xwe jî wan dibîne, bi êşa giyanê  
xwe

hebûna wan aferîdên çê an jî xirab hîs dike, di bin çavan re bi hêrs  
û gef

li feqî Dimso dinêre, xwe diguvişîne lê dengê xwe nake, Guziyê dîn  
berê

xwe bi feqî Dimso de dike û bi dengê xwe î monotonî dibêje:

— Ê bi Xwedê tu ditirsî, feqî Dimso... ma çima tu xwî dikî, heyran!...

A em ê jî şekalan bi dest xwe ve kin, em ê li ber cin û pîrebokan...  
em ê li

ber çê û xirabên wan pan bibin. Em ê dirêjî hev bikin û em ê bibînin  
ka

dayikên kê lorikan dibêjin!... lê feqî Dimso jî ditirse... bi Xwedê ew  
jî bi  
xwe de dirî!... ma ne wusa ye, xoce... tu û Xwedê ne wusa ye,  
xoce?... ma  
feqî Dimso bi xwe de narî?...

135

Xoce bêdeng e, bersiva van pirsan nade û şirove nake, heta derengî  
ro-  
jê jî li ber dîwarê lojmanê bi wî de dikevin, hûr hûr gotinan davêjine  
ber  
û hêdî hêdî dipeyivin, dû re pê didine zanîn ko di van demên dawîn  
de  
wî xwe ji gund û şênîyan dûrxistiye, ev tevgera wî bûye sedemên  
gotinên  
cuda cuda, bi kurtî jê re çêlî van sedemên cuda cuda dikin, mijara  
gale-  
gala wan dîsa vedigere û tê li ser cinan disekine, Sêvdînê Selîm bi  
tevgera  
salmezinekî gund pêşniyar dike û dibê:  
— Tu were bi ya me bike û biçe, xoce. Xuyaye ji me çêtiran cî li te  
teng  
kirine, biçe xwe bigêhîne ziyareta Girnewaz û xwe bavêje bextê Pîrê  
wan.  
Tu jî dibînî... dibînî ko li te azirî ne, êdî ne nivişt, ne bazbend û ne jî  
ayetên pêrozwer... bandora tiştê li wan çêtiran nabe.  
Mîna ko rastiya van gotinên Sêvdînê Selîm bipeyitîne, Siyabendê

yekçav î cinî serê xwe dihejîne, serê feqî Dimso jî diheje û bi rewşeke hêvî-

dar lê bi dilekî şewitî di ber xwe de dike pilepil û dibê:

— Xwedê lê rabe dilovaniyê!... wan jî kesek ne dîtî, hatin... hatin û bi

vî rebenê ha ve zeliqîn.

Bi mamoste Kevanot wusa tê ko hemû gundiyan peyva xwe yek kirine,

ew peyva ha jî xistine devê Sêvdînê Selîm û şandine ba wî, lê ew bi ya wan

nake, tiştêkî din dike, ji nişka ve xwe hêrs dike, mîna ko tevayiyê kerb û

tirsa xwe ya van demên dawîn di serê feqî Dimso de biteqîne, radibe ser

xwe û destê xwe ber bi wî bilind dike:

— Ji me ne çêtir in! Ji herkesê û ji hertiştî jî xirabtir in ew!... dibêje, serê

xwe di nava herdu lepên xwe de diguvişîne, li dora xwe zîz dibe, devê xwe

tije gotinên naxoş dike û di ser van gundiyan de direşîne: Hûn jî çiqas

ehmeq in!... bêyî ko hûn tiştêkî bizani bin, ji wan aferîdên kambax re

dibêjin, ji me çêtir!... Ji gû jî ne çêtir in ew!... Ka we ji ko derxistiye ko ew

ji me çêtir in!... de ka bibêjin, rebenên Xwedê, ehmqên Xwedê!... Bibêjin

ka çiyê wan ji me çêtir e!... nese kinin, netirisin, bibêjin!...«

Nêrgisa jina wî di pencerê re bi hustuxwarî li vê birebira mêrê xwe temaşe dike, êdî Xwedê dizane bê çima lê Sêvdînî Selîm tişteki nabêje, fe-

qî Dimso tişteki nabêje, Siyabendê yekçav î cinî tişteki nabêje, tenê Guzîyê dîn destê xwe ber bi feqî Dimso bilind dike û dibê:

— Çima tu xwê dikî, heyran! Gotina xoce ye... xoce rast dibêje, heyran!... xoce ne dîn e, heyran!

Bi van gotinên dawîn re mamoste Kevanot dibe xwê û dikeve êgir, çavên wî tijî hêrs û hêsir dibin, diricife, dilerize, dest davêje hustukura

xwe, bişkovên ber xwe diqetîne, benê berbejna wî bi dest dikeve, bi

136

hêrseke taybetî wê jî ji hustuyê xwe derdixe, heta ko jê tê ji hewşa dibis-

tanê dûr davêje, wî destê xwe ber bi gund bilind dike, vedigere ser ew yên

pêş xwe û di ser wan de dike qîreqîr:

— Rabin, bi kuçên gund bikevin û bibêjin, xoce dîn bûye... bibêjin, xoce bi nexweşiyêke dûrî aqilan ketiye... bibêjin, êdî tewşomewşo dipeyive... bibêjin, li hemberî îblîs û şagirtên wî asê bûye!... De rabin!...

heta ko ji we tê biqîrin û bibêjin, xoce devê xwe dirêjî pêsîrên pîrecinan

kiriye û ji pêsîrên wan şîr kişandiye... bibêjin, xoce rastî pêxemberên ji

serê xwe nexweş û Xwedayên devbixwîn hatiye... De rabin û biçin!...

biçin wusa bikin!... wusa bikin ko bila gundê ehmeqan, gundê dînan,

gundê cinan, gundê îblîsiyan jî ji vê yekê haydar bibe!...

Hersê îblîsiyên li wir çavên xwe gir dikin û ji vê yekê haydar dibin, hay-

dar dibin û anuha dibînin bê mamoste Kevanot çawa bi van gotinên xwe

re dilerize, diricife, di ciyê xwe de rûdine, serê xwe dixwe nava lepên xwe û

dest bi girî dike.

Mîna gunehkarekî mezin bi deng û ji dilekî şewitî digirî.

137

Ev gotinên mamoste Kevanot, ev rewşa wî, ev tevgerên wî û ev giriyê wî

weke birûskekê tavalê di gund de deng dide û di kuçan de bilind dibe: »Li

hemberî çêtiran asê bûye, heşa û heft hezar carî heşa!... ji wan çêtiran re

gotinên naxoş kiriye, bi agir û bi mirinê lîstiya... zimandirêjiya Xwedê û

pêxemberan jî kiriye...« dibêjin, piçûk û mezinên şênîyên gund heyfa

xwe bi mamoste Kevanot tînin, dilê xwe bi mala wî dişewitînin:

»Maqûlekî di şeyê me de bû...« dibêjin û mîna ko ji nuha ve pêşerojên vî

maqûlî bibînin xwe bi xwe an jî di nav xwe de: »Ew jî çû, av û av çû rebeno!...« dibêjin, hûr hûr li ser dipeyivin, vê rewşa wî bi awayên dûr û

nêzîkî aqilan şirove dikin: »Ev ne karê aqilên ademiyan e... ew dîsa Xwedê

pê dizane... lê wusa xuyaye ko destekî veşartî, destekî ruhanî di sedemeke

weha de heye...« dibêjin û ji nav dernakevin, têngêhîjin ko tişteki weha

ji nişka ve çawa dikane bibe û dû re li xwe vedigerînin: »Ji bo wan ruhên

pîrozwer tew jî ne çetin e... ne çetin e ko ji nişka ve merivan bixerifînin,

dîn bikin û bikujin... gav û saet ji bo wan çêtiran yek e...« dibêjin, lê dîsa

jî ji bayê dudiliya xwe nafilitin, rasterast serwextî sedemên giraniya ari-

handineke weha nabin: »Qaşo mêrik ne ji gundê me ye jî...« dibêjin û

gelekî din jî dibêjin.

Lê ev dîtî û ev gotinên şênîyên gund sedemên vê rewşa mamoste Kevanot ji hev dernaxînin: »Gelek kes bi ber bayê wan çêtiran ketine û

em hemû jî pê dizanin... em pê dizanin ko ev kesên ha di pêlên ketina

xwe de li hemberî çêtiran asê ne bûne. Heşa heşa... ji wan re gotinên nax-



oş ne kirine. Na, kesekî jî wusa ne kiriye. Di rewşên weha de hertim tir-

siyane, li ber wan geriyane, ji wan çêtiran lava kirine ko dev jê berdin....

bi gotineke din kesek jî mîna vî xoceyê me ne bûye. Kesek mîna wî asêkar

ne bûye.« dibêjin, diramin, bi hev dişêwirin: »Bi devê xwe jî... wî bi devê

xwe jî gotiye ko ji pêşîrên wan çêtiran şîr kişandiye... diyar e ko ew jî

ketiye nav wan û bûye yekî ji wan...« dibêjin, dû re miriyên îsalîn dijmêrin û di dawiya dawîn de jî sedemên vê bûyerê digêhînin Mekanê

Mala Dînan.

Şêniyên gund bi tirs û xofeke veşartî hevdu haydar dikin û: »Sala ko li

gund mirinek dest pê bike heta dawiya wê salê, Mekanê Mala Dînan 138

daxwaza heft mirinan dike û em hemû jî bi viya dizanin. Anuha beriya ko

sal dawiyê li xwe bîne hejmara miriyên îsalîn bûye şeş. Ji bo ko ev hejmar

derkeve heftan û bibe saleke weke hersal Mekanê Mala Dînan ev yeka ha

bi serê xoce de haniye.« dibêjin

Ji şêniyên gund çend kes lê zêdetir dikin û çêlî nêzîkiya mirinekê jî

dikin, mîna ko ji anuha ve li paş miriyekî bipeyivin di navîna xwe de  
çêlî  
çeyî û başiyên mamoste Kevanot dikin: »Di peyivîna xwe de hertim  
got-  
inên mîna şekir ji devê wî derdiketin.« dibêjin, bi awakî çîrokane  
tevgerên wî bi lêv dikin, bilûrvanê oda gund Şefoyê kwîr dike ko li  
ser  
qulên bilûra xwe ji bo wî melodiya bextekî reş bihûne, biguvîne û  
bilorîne.  
Lê dîsa jî bi hêviya ko mamoste Kevanot ê piçekî baş bibe û were  
ser  
xwe, carina bi şev û carina jî bi roj şênîyên gund diçin serlêdana wî,  
li  
rewşa wî dipirsin, bangî malên xwe dikin, pê didine zanîn ko weke  
demên berê ew li nav malan bigere, biçê di oda gund de rûne, di  
kuçan  
de bi şênîyan re henekan bike û bi wan re bikene, bi wan re derkeve  
nêçî-  
ra çûçikan, zivistaneke bi berf û bager li pêşiya wan e, ew ê dîsa bi  
hev re  
biçin û nola hersal di kozikan de hetanî destê sibê li bendî nêçira  
roviyan  
rûnin.  
Lê na, mamoste Kevanot weke wan nake, çî dibêjin çî dixwazin pirî  
caran guhdariya wan jî nake, tew carina wî hay ji hatin û hebûna  
wan jî  
tuneye, berê tenê di hinek pêlan de diricifî, dilerizî û diket lê anuha  
tenê

di hinek demên kurt de tê ser xwe, hay ji hebûna xwe dibe û çê xirab dipeyive, lê wê çaxê jî ji vê rewş û tevgera xwe şerm dike.

Anuha ev tevgera şermesar li wî bûye tirs, li wî bûye rik û li wî bûye gelek tiştên din: mîna wan psîkonexweşên ko ji herkesî ji hertiştî ditirsin

û direvin, mîna wan şêxên ko xwe di binê çarşefên mezin de dinixumînin

û li bendî wersirekê ne, mîna wan pêxemberên ko xwe davêjin binê şikeftên çiyayên bilind û li wir li Xwedayan digerin... belê, mamoste Kevanot jî mîna van hemû ruhên ha hertim ji gund û şêniyan vedikişe,

dûrdikeve, bi gotina şêniyên gund dîwarê hewşa dibistanê jê re dibe weke

toqa şeytên û ew ji hundurê wê dernakeve der, di piraniya van demên

xwe de hertim serê wî di ber de û di hundurê vê hewşê de digere, tufî erdê,

tufî dora xwe dike, devê xwe ber bi jor tûjikî dike û tufî asimanan dike,

mîna golikê ko ji moz û mêşekê veniciqe carina ji nişka ve li paş xwe dizivire û zîz dibe.

Ev rewşa ha jê re dibe xwî, jê re dibe huner, jê re dibe kar û karê

139

mamostetiyê ji bîra dike, pirî caran nizane deriyê dersxanê jî ji zarokan re

veke û wan berde hundur, tenê li derve li hewşa dibistanê weke vatinî an

jî nexweşiyê kevin rastî zarokan tê, wan radiwestîne, li wir  
lîstikekê  
dide ber wan, wan li hev siwar dike, wan berdide hev, li dora wan  
dibeze,  
dike qîreqîr û wan li hev sor dike.  
Şênîyên gund serwext dibin ko êdî bi kêrî karê xwe, bi kêrî hîndayîna  
zarokan nayê, destên xwe jê dişon, lê dîsa jî dipên, bi hêviya ko  
Xwedê  
mezin e, bi hêviya ko cin ê rojekê lê werine dilovaniyê, dev jê berdin  
û ew  
jî dîsa bibe mamoste Kevanotê berê.  
Ji van demên dawîn mamoste Kevanot rojekê weke hertim radibe  
û  
diçe ser taştê, li ser taştê jina wî dinêre ko mêrê wê dîsa bi raman  
e, bi  
rewşeke seyr li ber taştê rûniştiye, di ser nan û pêxwarinên pêşiya  
xwe de  
xwar bûye, bêyî ko destê xwe dirêjî tiştê bike û bixwe, bi baldarî  
dinêre,  
Nêrgisa koçer wusa têdigêhîje ko weke gelek carên berê vê carê jî  
mêrê wê  
li bendî pêla bayekî cinan e û hêrişeke wan dipê, têdigêhîje ko ev  
rewşa wî  
ji carên hercarîn cudatir û girantir e, dengêkê lê dike û jê re dibê:  
— Ko dereke te dêşe û tu nerihet î, ez... ez biçim ji zarokan re  
bibêjim  
û îro jî wan bişînim malan.

Mîna ko bi ruh û raman ji dereke dûr û dûr vegere, mamoste Kevanot

ji nişka ve serê xwe radike, li jina xwe vedigerîne û dibê:

— Na, na... dereke min... Ez hinekî weha noqî ramanan... min dikir ko

ez lîstikeke nû... ez ê îro lîstikekê pêşanî zarokan bikim û bi wan re bilîz-

im.

Piştî xwarina taştê bi giraniya wan ramanan radibe, ji lojmanê derdikeve hewşa dibistanê, weke hemû rojên xwendinê îro jî zarok ji zû

ve li hewşa dibistanê gêhîştine ser hev, mamoste Kevanot dîsa pêwîst

nabîne ko zarok têkevîne dersxanê, li wir li hewşê bi wan dide zanîn ko

ew ê îro lîstikekê bilîzin, lîstikek ko heta nuha ew pê ne lîstine, ji bo pêwîstiya vê lîstikê jî bi zarokan dide zanîn ko divê ew biçin malên xwe û

her yek şewqe, kum an jî kolezekî bîne, dû re jî li gotinên xwe zêde dike

û dibêje:

— Ne girîng e ko kevin an jî nû be.

Herweha hemû zarok bi kêfxweşiya vê lîstika nû li kuçên gund belav dibin, bi cax û ciyê kincên malên xwe dikevin, ji dê, dapîr an jî endamekî

malê dipirsin, daxwaza kum, şewqe û kolozan li wan dikin, zarokên ko li

malê rastî mezinekî endamê malê nayên, ew jî bi xwe di malê de digerin,

tiştêkî weha peyda dikin û ber bi jor dikişin.

140

Di navberê de gelek wext nabuhure ko babet bi babet kum û koloz di

destên zarokan de û li hewşa dibistanê dicivin ser hev, mamoste Kevanot

dide pêşiya zarokan û weke garaneke golikan wan dikişîne axpîna kêleka

dibistanê, li wir zarokan li hev dike kulor û ew jî di nava wan de radiweste, lîstika nû û rêdara wê ji zarokan re kat dike û dibêje:

— Van kum û kolozên di destên xwe de heta ko ji me tê em ê ber bi jor,

ber bi asimanan bavêjin... û heta ko ji me tê em ê li dû wan biqîrin... em

ê biqîrin û bibêjin: »Hatin!... ha, hatin!... melek û periyên asimanî hatin!...« Kîjan kumê ko berê bigêhîje erdê, em ê navekî lê bikin... em ê

bibêjin, ev bêyom e, ev cin e, ev şeytan e û dû re jî em ê bi keviran têkevîne

ser heta ko ew kumê ha perçe perçe dibe.

Mîna qumandarekî leşgerên nû û naşî, mamoste Kevanot car bi car rê-

darên vê lîstika nû ji xwendekarên xwe re bi lêv dike, xwendekarên ko

kum û kolozên nû hanîne, di wê gavê de poşmaniyêke zarokane li wan  
radibe, tirsê bav û birayên malê dikeve dilê wan, lê dîsa jî bi gotina  
mamostê xwe dikin û dest bi lîstika nû dikin.  
Kum, koloz û şewqe li hewa dilîzîkin, tev mamoste Kevanot hemû  
zarok li pey kum û kolozan dibezin, deng û qêrîneke seyr bi axpîna  
pêş  
malan dikeve, ev deng û ev qêrîna seyr di ser gund de pêl dide, li  
dar û  
dîwarên hewşan datê, şênîyên li nav malan bi dilpekîn ber bi axpîne  
tên  
û dibînin, dibînin ko mamoste Kevanot di van demên xwe yê  
dawîn de  
cara pêşîn jî hewşa dibistanê derketiye der, li axpîne weke gayê nav  
go-  
likan li pey kum û kolozan diqêre, dû re tev zarokan bi keviran  
dikemişe  
ser kum an jî şewqeyekî.  
Şênîyên ko ber bi deng hatine û li axpîne berhev bûne pêşiyê jî vê  
der-  
ketina mamoste Kevanot kêfxweş dibin û dikenin, paşîngê bi  
mitûmatî  
li vê bergehê temaşe dikin û baş têdigêhîjin ko ev ne karekî aqilan  
e, ne-  
maze jî dema ko gundiyê bi navê hecî Xopo dibîne, anuha ew dibîne  
bê  
neviyê wî çawa kumê kalê xwe î hecê ber bi jor divirvirîne, zirîç û  
nexşên

kumê heculeswedî li ber tîrêjên tava payîzê kesk dibiriqin, dû re jî dibîne

bê çawa tev mamoste Kevanot hemû zarok li ser vî kumê wî dicivin û ke-

vir dikin, a wê çaxê çav li serê hecî Xopo tarî dibin, mîna ko bibeze pevçûnekê bi gavên hişk, bi hêrseke tevlihev ber bi wan diçe û dibê:

— De werin û ji xwe re lê binêrin, ha!... Ero, xoce!... ma tu jî zarok î,

xoce!... tu şerm nakî?... ev çi karê te ye, xoce!... ma ev jî ders e, gidî!... tu

dîn bûyî, xoce, dîn!...

Hecî Xopo di vê hêrsê de xwe digêhîne neviyê xwe, bilind dike û

141

rasterast weke kunekî avê bi erdê de dide, hemû zarok ji ser kumê wî

vedikişin, hecî Xopo kumê xwe î bi zirîçên kesk ji erdê ji nava keviran radike, mîna ko di devê hespekî dîn de hati be cûtin, ev kumê ha jî bi lê-

dana keviran qulqulî bûye, hecî Xopo bi xemgînî serê xwe li ba dike, bi

hêrs neviyê xwe î li erdê pîn dike û dibê:

— Tu ji kerê de bikevî, lawo!... tu bi jara marê heftserî biçî, lawo!... tu

biquرمىçî!... ev kumê pîrozwer!... miriyê heftan tu bî, lawo!...

Ji bazdanê, ji lîstikê hilkehilka hespekî dîn bi mamoste Kevanot girtiye,



hêdî hêdî ber bi hecî Xopo tê, bi zenda xwe xwîdana eniya xwe paqij dike

û dibê:

— Na... hecî... Xop... na... bêhna xwe teng neke... zarok in... bila ji xwe re bilîzin.

Vê carê jî hecî Xop bi hêrs berê xwe bi mamoste Kevanot de dike û dibê:

— Min lîstikên weha ne dîtiye, xoce!... ma ev jî lîstik e!... lî... lî... lîstikên weha!...

Xoce destê xwe ber bi hecî Xopo dirêj dike, peyva wî dibire û dibê:

— De ka tu çî dizanî, hecî Xop!... ev lîstikeke nû ye û ji bo zarokan... ji

bo wan tişteki nû ye!...

Mirûzê hecî Xop tûj û tirş dibe, bi niçeniç serê xwe dihejîne, destê xwe

li ba dike û dibe birebira wî:

— Ev lîstika ha, lîstika dînan e, xoce. Min ne dîtiye ko kesên baqil kumê xwe dane ber keviran, kincên xwe çirandine... ev tevgerên weha

tevgerên dînan e... tu dîn bûyî û hew!...

Hecî Xopo û mamoste Kevanot bi birebir dev davêjin hev, xwe radikêşin hev, dest davêjin hustukurên hev, hevdu dibin û tînin, ji nişka

ve zenda hecî Xopo dikeve devê mamoste Kevanot, qêrîneke bêwext bi

hecî Xopo dikeve, şênîyên li wir dikevin navbera wan, wan ji hev dikin û

dixwazin hêrsa wan daxînin, lê ev herdu qayîşkêşên ha di nava  
lepên

gundiyan de hustuyên xwe dirêjî hev dikin, destên xwe li hev li ba  
dikin,

şênîyên ko bi hecî Xopo girtine di guhên wî de dikine pistepist û:

— Hêrsa xwe daxîne, hecî, piçekî têbigêhîje... tibigêhîje ko ew  
mamoste ye, mêvanê me ye, ne ji gundê me ye, dibêjin, lê hecî  
Xopo di

nava lepên wan de berê xwe dide hêla mamoste Kevanot, hustuyê  
xwe î

qermeçî dirêj dike, zenda xwe ya birîndar ber bi wî radike û bi  
dengekî

bilind dibê.

— Kî dibe bila bibe!... serê wî bixwe!... kî tê gundê me, tasek ava  
gundê

142

me vedixwe, ji me xirabtir dibe... Ko weke me... weke me bi satilan,  
bi

salan, bi dehsalan ava gundê me vexwarana, ew ê bi gûyê xwe  
bilîstana!...

Hêrsa pevçûnê li mamoste Kevanot mezin dibe, dibe dirik û wî pîj  
dike, xwe dirêjî qayîşkêşê xwe dike, dest û piyên gundiyan li ber  
dibine

asteng û xwe nagêhîne hecî Xopo, xwe radikêşe, xwe li ba dike û  
xwe

dîqoqizîne lê ji astengiya lepên gundiyan nafilite, xwe davêje erdê  
û xwe

dîgevîzîne lê gundî wî bernadin, hêrs û giriyê xwe li nav hev dixwe,

meziniya hêrsa xwe duqat û du hezar caran ewqas qat mezin dike,  
dest  
davêje hustukura xwe, bişkovên ber xwe diqetîne, li wî gundî, li wê  
ax-  
pînê û li wî erdî zenda xwe digêhîne devê xwe, ji nişka ve gez dike û  
weke  
zenda hecî Xopo xwîneke sor ji xwe jî dirijîne.  
Ev rewşa mamoste Kevanot bi piçûk û mezinên gund li kuçan belav  
dibe, dibe mijar û li ber argûnan bi lêv dibe, di pixêrî û pencerên  
malên  
gund de dibe deng û olan dide.  
Wê salê beriya ko berfa payîza paşîn bikeve, ev rewşa ha ji wir, ji  
nava  
gund û şêniyan derdikeve, digêhîje nexweşxanan, digêhîje bajarên  
dûr û  
karmendên destê yekem pê dihesin.

143

LALÊŞ QASO

roman

\*\*

LI BENDA GODOT

Samuel Beckett

Ev phtûk ji ber wergerên wergerên swêdî û tirkî hatiye  
wergerandin. wergerandin.

LI BENDA GODOT

Samuel Beckett

PIYES

Wergen Firat Cewerî

Weşanên NÛDEM

LI BENDA GODOT

Samuel Beckett

PIYES

Wergen Firat Cewerî

Weşanên NÛDEM

Weşanên NÛDEM: 12

Li Benda Godot

Çapa yekem: Stockholm 1995

© Kurdiya wê Weşanên NÛDEM

Pergala berg û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Sheila Critchley

Wêneya Samuel Beckett: Liitfi özkök

Navê eslî: En Attendant Godot

Wergera swêdî: I vantan pa Godot

Wergera tirkî: Godot'yu Beklerken

ISBN: 91-88592-111

Navnîşan:

Termov. 52, 2 tr.

175 77Jarfalla-Sweden

TelûFax: 8-58356468

Weşanên NÛDEM: 12

Li Benda Godot

Çapa yekem: Stockholm 1995

© Kurdiya wê Weşanên NÛDEM

Pergala berg û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Sheila Critchley

Wêneya Samuel Beckett: Liitfi özkök

Navê eslî: En Attendant Godot

Wergera swêdî: I vantan pa Godot

Wergera tirkî: Godot'yu Beklerken

ISBN: 91-88592-111

Navnîşan:

Termov. 52, 2 tr.

175 77Jarfalla-Sweden

TelûFax: 8-58356468

\* A>. KESEN TE DE

ESTRAGON

VLADIMIR

LUCKY

POZZO

LAWIKEK

\* A>. KESEN TE DE

ESTRAGON

VLADIMIR

LUCKY

POZZO

LAWIKEK

PERDEYA YEKEMÎN

Riya gund, darek.

Êvar.

Estragon li erdê rûniştiye û dixwaze soleke xwe ji  
pê bike. Wî bi herdu destan bi sola xwe girtiye û  
bi hemû hêza xwe dikişîne. Gava diweste, radiweste,  
bêhna xwe digire û berdide, paşê dîsan eynî

tiştî dike. Eynî herekatê dike. Vladimir dikeve hundur.

ESTRAGON (Ji bo bêhnberdana xwe radiweste): Çênabe.

VLADIMIR (çîmên wîji hev, bi gavên kurt ber bi wî ve dimeşe):  
Yji bawer im. (Bêtevger dimîtie.) Ez demeke dirêj li hemberî vê ramanê derketim; min xwe bi xwe, Vladimir, got, aqilê xwe bi serê xwe de, te hê her tişt neceribandîye. Min piştî wê şerê xwe domand. (Gava ew li têkoşîna xwe difikire, ew xayiz dibe. Ji Estragon re) Li min binêre, dêmek tu dîsan li vir î.

ESTRAGON Tubawerî?

VLADIMIR: Ez bi dîtina te kêfxweş bûm. Min texmîn dikir ku tu ê careke din bi paş de venegerî.

ESTRAGON: Min jî.

VLADIMIR: Em ji bo pêrozkirina hevdu dîtina xwe çî bikin? (Difikire.) Ka rabe ser xwe da ez te hemêz bikim û

PERDEYA YEKEMÎN

Riya gund, darek.

Êvar.

Estragon li erdê rûniştiye û dixwaze soleke xwe ji pê bike. Wî bi herdu destan bi sola xwe girtiye û bi hemû hêza xwe dikişîne. Gava diweste, radiweste, bêhna xwe digire û berdide, paşê dîsan eynî tiştî dike. Eynî herekatê dike. Vladimir dikeve hundur.

ESTRAGON (Ji bo bêhnberdana xwe radiweste): Çênabe.

VLADIMIR (çîmên wîji hev, bi gavên kurt ber bi wî ve dimeşe):

Yji bawer im. (Bêtevger dimîtie.) Ez demeke dirêj li hemberî vê ramanê derketim; min xwe bi xwe, Vladimir, got, aqilê xwe bi serê xwe de, te hê her tişt neceribandîye. Min piştî wê şerê xwe domand. (Gava ew li têkoşîna xwe difikire, ew xayîz dibe. Ji Estragon re) Li min binêre, dêmek tu dîsan li vir î.

ESTRAGON: Tubawerî?

VLADIMIR: Ez bi dîtina te kêfxweş bûm. Min texmîn dikir ku tu ê careke din bi paş de venegerî.

ESTRAGON: Min jî.

VLADIMIR: Em ji bo pîrozkirina hevdudîtina xwe çi bikin? (Difikire.) Ka rabe ser xwe da ez te hemêz bikim û te maçî bikim.

(Destê xwe dirêjî Estragon dike.)

ESTRAGON (Bi hêrs.): Paşê, duwayî.

(Bêdeng)

VLADIMIR (Xeyidî ye, bi sarî): Gelo ma em dikarin fêr bibin bê beg efendî şeva xwe li ku derbas kiriye?

ESTRAGON: Di kortalekê de.

VLADIMIR (Bi şaşmayîn): Di kortalekê de! Te ew ji ku dît?

ESTRAGON (Bê ku hêlekê nîşan bide): Li van deran.

VLADIMIR: Ma te lêdan jî xwar?

ESTRAGON: Min xwar... Lê ne zêde.

VLADIMIR: Her eynî?

ESTRAGON: Eynî? Nizanim.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ez difikrim... ji wê demê ve... kî dizane... tu ê

têketa çi rewşê... ger ne ji min bûya...ez xwe bi xwe dibêjim. (Bi biryarî) Tu ê niha ji komeke reben ya hestiyar pê ve ne tiştê bûya, ez sond dixwim.

ESTRAGON (bi hêrs): Wekî din.

VLADIMIR (bi acizî): Lê evqas jî li kesekî bi tenê nayê kirin.

(Demek. Şidyayî.) Ez ji hêlekê ve jî xwe bi xwe dibêjim, çi hewce ye ku ez bêhêvî dibim. Diviyabû hê di destpêkê de li vê bihata fikirandin, berbilgîfilan.

ESTRAGON: Bes e. Ji bo derxistina vê cenabetê alîkariya min bike.

VLADIMIR: Me dikarîbû bi destên hev bigirta û xwe ji qûleya Eiffelê biavêta, bi yê ku xwe pêşî avêtin re.

Ew dem dirhem û du dendik in. Niha êdî pirr dereng e. (Estragon bi sola xwe re pevdiçe) Tu çi dikî?

te maçî bikim.

(Destê xwe dirêjî Estragon dike.)

ESTRAGON (Bi hêrs.): Paşê, duwayî.

(Bêdeng)

VLADIMIR (Xeyidî ye, bi sarî): Gelo ma em dikarin fêr bibin bê beg efendî şeva xwe li ku derbas kiriye?

ESTRAGON: Di kortalekê de.

VLADIMIR (Bi şaşmayin): Di kortalekê de! Te ew ji ku dît?

ESTRAGON (Bê ku hêlekê nîşan bide): Li van deran.

VLADIMIR: Ma te lêdan jî xwar?

ESTRAGON: Min xwar... Lê ne zêde.

VLADIMIR: Her eynî?



ESTRAGON: Eynî? Nizanim.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ez difikrim... ji wê demê ve... kî dizane... tu ê têteta çi rewşê... ger ne ji min bûya...ez xwe bi xwe dibêjim. (Bi biryarî) Tu ê niha ji komeke reben ya hestiyar pê ve ne tiştê bûya, ez sond dixwim.

ESTRAGON (bi hêrs): Wekî din.

VLADIMIR (bi acizî): Lê evqas jî li kesekî bi tenê nayê kirin. (Demek. Şidyayî.) Ez ji hêlekê ve jî xwe bi xwe dibêjim, çi hewce ye ku ez bêhêvî dibim. Diviyabû hê di destpêkê de li vê bihata fikirandin, berbilgîfilan.

ESTRAGON: Bes e. Ji bo derxistina vê cenabetê alîkariya min bike.

VLADIMIR: Me dikarîbû bi destên hev bigirta û xwe ji qûleya Eiffelê biavêta, bi yên ku xwe pêşî avêtin re. Ew dem dirhem û du dendik in. Niha êdî pîrr dereng e. (Estragon bi sola xwe re pevdiçe) Tu çi dikî?

ESTRAGON: Ez sola xwe derdixim. Qey ev yeka nehatiye serê te?

VLADIMIR: Ji kengî ve ye ku ez ji te re dibêjim, divê tu her roj wan derêxî. Tu fêhm nakî ku.

ESTRAGON (bêhêz): Alîkariya min bike!

VLADIMIR: Ma laşê te diêşe?

ESTRAGON: Ma laşê min diêşe? Bala xwe bide pîrsê!

VLADIMIR (Hêrs dibe): Ma qey tenê tu êşê dikişînî! Ma ez çi me? Ka tu carekê têkeve şûna min, ez te bibî-

nim.

ESTRAGON: Te jî êş kişandiye?

VLADIMIR: Te jî êş kişandiye! Te jî êş kişandiye? ew ji min dipirse!

ESTRAGON (Bi tiliya xwe nîşan dide): Ger tu bişkokên pantorê xwe bigirî tu ê baş bikî.

VLADIMIR (Li ber xwe dinihêre.) Rast e. (Bişkokên pantorê xwe digire.) Mirov nikane tiştên biçûk îhmal bike.

ESTRAGON: Tu dixwazî ez çî ji te re bibêjim, tu her tiştî dihêlî deqîqa dawî.

VLADIMIR (Xayiz dibe): Deqîqa dawî... (Di nava ramanan de) Wê dirêj bajo, lê wê baş bibe. Kê ev digot?

ESTRAGON: Ma tu ê alîkariya min nekî?

VLADIMIR: Carina, ez dibêjim dîsan jî nêzîk dibe. Ez wê demê xwe ecêb hîs dikim. (Şewqê xwe ji serê xwe dike, li hundurê şewqe dinihêre, destê xwe li hundurê wîdigerîne, dawdişîne, dixwe serê xwe.) Ez çawa bêjim? Hem mîna ku ez rehet bûme, hem ji...(li gotinê digere.)... bi tirs. (bi nepixandin)

DI:HUNDURÊ:TIRSÊ:DE. (Dîsan şewqê xwe ji serê xwe dike, li hundurê wî dinihêre.) Evqas jî zêde ye! (Mîna ku ew dixwaze tişteki ji hundurê

ESTRAGON: Ez sola xwe derdixim. Qey ev yeka nehatiye serê te?

VLADIMIR: Ji kengî ve ye ku ez ji te re dibêjim, divê tu her roj wan derêxî. Tu fêhm nakî ku.

ESTRAGON (bêhêz): Alîkariya min bike!

VLADIMIR: Ma laşê te diêşe?

ESTRAGON: Ma laşê min diêşe? Bala xwe bide pirsê!

VLADIMIR (Hêrs dibe): Ma qey tenê tu êşê dikişînê! Ma ez çî me? Ka tu carekê têkeve şûna min, ez te bibînim.

ESTRAGON: Te jî êş kişandiye?

VLADIMIR: Te jî êş kişandiye! Te jî êş kişandiye? ew ji min dipirse!

ESTRAGON (Bi tiliya xwe nîşan dide): Ger tu bişkokên pantorê xwe bigirî tu ê baş bikî.

VLADIMIR (Li ber xwe dinihêre.) Rast e. (Bişkokên pantorê xwe digire.) Mirov nikane tiştên biçûk îhmal bike.

ESTRAGON: Tu dixwazî ez çî ji te re bibêjim, tu her tiştî dihêlî deqîqa dawî.

VLADIMIR (Xayiz dibe): Deqîqa dawî... (Di nava ramanan de) Wê dirêj bajo, lê wê baş bibe. Kê ev digot?

ESTRAGON: Ma tu ê alîkariya min nekî?

VLADIMIR: Carina, ez dibêjim dîsan jî nêzîk dibe. Ez wê demê xwe ecêb hîs dikim. (Şewqê xwe ji serê xwe dike, li hundurê şewqe dinihêre, destê xwe li hundurê wîdigerîne, dawdişîne, dixwe serê xwe.) Ez çawa bêjim? Hem mîna ku ez rehet bûme, hem ji...(li gotinê digere.)... bi tirs. (bi nepixandin)

DI:HUNDURÊ:TIRSÊ:DE. (Dîsan şewqê xwe ji serê xwe dike, li hundurê wî dinihêre.) Evqas jî zêde ye! (Mîna ku ew dixwaze tişteki ji hundurê şewqe bixîne, ew li piştê şewqe dixwe, dîsan li hundurê

wî dinihêre, dixe serê xwe.) Neyse... (Estragon bi cehdek muthîş û dawî di derxistina sola xwe de bi ser dikeve. Li hundirê wê dinihêre, destê xwe di hundurê wê de digerîne, serberjêr dike, dawdişîne, tnîna ku tişteki ji hundurê wê ketibe li erdê dinihêre, tişteki nabîne, dîsan destê xwe li hundurê sola xwe digerîne, nêrînên wîşêlo ne.)

VLADIMIR: Êê, paşê?

ESTRAGON: hîç.

VLADIMIR: Ka nîşanî min bide.

ESTRAGON: Tişteki ku ez nîşanî te bidim tune ye.

VLADIMIR: Dîsan dixe pê.

ESTRAGON: Bila hebekî hewayê bistîne.

VLADIMIR: Ev e, li hemberî we bi her awayê xwe mirov.

Yê sûcdar lingê wî ye, ew bi sola xwe re hêrs dibe.

(Ew dîsan şewqê xwe derdixe, li hundurê wîdinihêre,

destê xwe li hundurê wî digerîne, dawdişîne,

li jorî wî dixe, pifî hundurê wî dike, dîsan dixe serê

xwe.) Ji dîzan yek xelas bû. (Demek.) Nisbetek

tê qebûlkin. (Demek.) Gogo...

ESTRAGON: Çi ye?

VLADIMIR: Ma em poşman bibin, hi?

ESTRAGON: Ji çi?

VLADIMIR: Çîk... (Lê digere.) Ne pêwîst e ku em têkevin

teferûata.

ESTRAGON: Yê bûyina me?

(Vladimir bi pîrçîn dikene, destê xwe dattne ber

zikê xwe û xwe digire.)

VLADIMIR: Edî ji bo ken jî mêrxasî divê.

ESTRAGON: Mehrûmîyetek e.

VLADIMIR: Ji xwe tdştê maye, kenek maye. (Li rûyê wt keşewqe bixîne, ew li piştta şewqe dixê, dîsan li hundurê wî dinihêre, dixê serê xwe.) Neyse... (Estragon bi cehdek muthîş û dawî di derxistina sola xwe de bi ser dikeve. Li hundirê wê dinihêre, destê xwe di hundurê wê de digerîne, serberjêr dike, dawdişîne, tnîna ku tiştêk ji hundurê wê ketibe li erdê dinihêre, tiştêkî nabîne, dîsan destê xwe li hundurê sola xwe digerîne, nêrînên wîşêlo ne.)

VLADIMIR: Êê, paşê?

ESTRAGON: hîç.

VLADIMIR: Ka nîşanî min bide.

ESTRAGON: Tiştêkî ku ez nîşanî te bidim tune ye.

VLADIMIR: Dîsan dixê pê.

ESTRAGON: Bila hebekî hewayê bistîne.

VLADIMIR: Ev e, li hemberî we bi her awayê xwe mirov.

Yê sûcdar lingê wî ye, ew bi sola xwe re hêrs dibe.

(Ew dîsan şewqê xwe derdixê, li hundurê wîdinihêre,

destê xwe li hundurê wî digerîne, dawdişîne,

li jorî wî dixê, pifî hundurê wî dike, dîsan dixê serê

xwe.) Ji dîzan yek xelas bû. (Demek.) Nisbetek

tê qebûlkin. (Demek.) Gogo...

ESTRAGON: Çi ye?

VLADIMIR: Ma em poşman bibin, hi?

ESTRAGON: Ji çi?

VLADIMIR: Çîk... (Lê digere.) Ne pêwîst e ku em têkevin

teferûata.

ESTRAGON: Yên bûyina me?

(Vladimir bi pîrçîn dikene, destê xwe dattne ber zikê xwe û xwe digire.)

VLADIMIR: Edî ji bo ken jî mêrxasî divê.

ESTRAGON: Mehrûmîyetek e.

VLADIMIR: Ji xwe tdştê maye, kenek maye. (Li rûyê wt kenekî fireh, mîna kêrekê belav dibe û dicemide, ew demeke dirêj wilo dimîne, paşê bi carekê ve winda dibe.) Ne eynî tişt e. Em çî bikin... (Demek.) Gogo...

ESTRAGON (mîna ku aciz bûbe): Dîsan çî ye?

VLADIMIR: Ma te încîl xwendiyê?

ESTRAGON: încîl? (Difikire.) Herhal min çavek lê gerandiyê.

VLADIMIR (ecêbmayî dimîne): Li dibistana bêxweda?

ESTRAGON: Ez nizanim bê bi Xweda bû, an bê Xweda bû.

VLADIMIR: Tu la Roquette û islhavî bi dibistanê re tevlihev dikî.

ESTRAGON: Dibe. Ez nexeşiya erdê pîroz bi bîr tînim. Bi reng. Pîr xweşik. Deryaya mirî şînekî çilmisî bû.

Gava min li wê dinihêrî ziman û asmanê devê min ziwa dibû. Min xwe bi xwe digot, em ê li wir mehgingivîna xwe derbas bikin. Em ê têkevin avê, em ê dilşa bibin.

VLADIMIR: Diviyabû tu şaîr bûya.

ESTRAGON: Ez şaîr bûm. (Kincên xwe yên pertal pertalî nîşan dide.) Ma ne xuya ye?

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Min çi digot... Lingê te çawan bû?

ESTRAGON: Diwerime.

VLADIMIR: Temam, min çîroka vî dizî dît. Tê bîra te?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Ez ji te re behs bikim? Tu dixwazî?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Demê dibuhurîne. (Demek.) Du diz hebûne. Bi xelasker re di eynî demê de çarmîx bûye. Ji van...

ESTRAGON: Bi kê re?

10

nekî fireh, mîna kêrekê belav dibe û dicemide, ew demeke dirêj wilo dimîne, paşê bi carekê ve winda dibe.) Ne eynî tişt e. Em çi bikin... (Demek.) Gogo...

ESTRAGON (mîna ku aciz bûbe): Dîsan çi ye?

VLADIMIR: Ma te încîl xwendiyê?

ESTRAGON: Încîl? (Difikire.) Herhal min çavek lê gerandiyê.

VLADIMIR (ecêbmayî dimîne): Li dibistana bêxweda?

ESTRAGON: Ez nizanim bê bi Xweda bû, an bê Xweda bû.

VLADIMIR: Tu la Roquette û islhavî bi dibistanê re tevî-hev dikî.

ESTRAGON: Dibe. Ez nexesîya erdê pîroz bi bîr tînim. Bi reng. Pîrr xweşik. Deryaya mirî şînekî çilmisî bû.

Gava min li wê dinihêrî ziman û asmanê devê min ziwa dibû. Min xwe bi xwe digot, em ê li wir mehgingivîna xwe derbas bikin. Em ê têkevin avê, em ê dilşa bibin.

VLADIMIR: Diviyabû tu şaîr bûya.

ESTRAGON: Ez şaîr bûm. (Kincên xwe yên pertal pertalî nîşan dide.) Ma ne xuya ye?

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Min çî digot... Lingê te çawan bû?

ESTRAGON: Diwerime.

VLADIMIR: Temam, min çîroka vî dizî dît. Tê bîra te?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Ez ji te re behs bikim? Tu dixwazî?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Demê dibuhurîne. (Demek.) Du diz hebûne. Bi xelasker re di eynî demê de çarmîx bûye. Ji van...

ESTRAGON: Bi kê re?

10

VLADIMIR: Bi xelasker re. Du diz. Ji van yek xelas bûye, ê din jî... (Ew li gotina dijber ya hevmaneya "Xelasker" digere.)...tê gotin ku ew cehemî ye.

ESTRAGON: Ji çî xelas bûye?

VLADIMIR: Ji dogehê.

ESTRAGON: Ez diçim. (Ji cihê xwe tevnalîve.)

VLADIMIR: Lê... (Demek.) Çawan dibe ku... Ez hêvîdar im ez te aciz nakim.

ESTRAGON: Ez guhdarî nakim.

VLADIMIR: Çawan dibe ku ji çar hawariyan tenê yek bûyeran wilo dide? An na hersê jî li wir bûn: yanî, ne pirr dût bûn. Ê ji nav wan tenê yek behsa dizekî ku xelas bûye dike. (Demek.) Binêr, lê, Gogo, ger tu di nav re carna bipeyivî wê ne xerab be.

ESTRAGON: Ez guhdarî dikim.



VLADIMIR: Ji çaran yek. Dudu ji hersiyên din qet behsa vê yekê nakin, yê sisiyan jî dibêje ku herdiwên din ji dê û jina wî re xeberan didin.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Çawa?

ESTRAGON: Ez tiştêkî fêhm nakim... (Demek.) Ji dê û jina kê re xeberan didin?

VLADIMIR: Ji yên xelasker re.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku wî nexwest ew wan xelas bike.

ESTRAGON: Ji dogehê?

VLADIMIR: Çi munasebet canê min! Ji mirinê.

ESTRAGON: Çi bûye, baş e?

VLADIMIR: Wê çaxê divê herdu jî dogehê bin.

ESTRAGON: Ê?

VLADIMIR: Lê yê din dibêje, yek xelas bûye.

ESTRAGON: Çi bi vê heye? Dêmek eynî nêrînê neparêzin.

11

VLADIMIR: Bi xelasker re. Du diz. Ji van yek xelas bûye, ê din jî... (Ew li gotina dijber ya hevmaneya "Xelasker" digere.)...tê gotin ku ew cehemî ye.

ESTRAGON: Ji çi xelas bûye?

VLADIMIR: Ji dogehê.

ESTRAGON: Ez diçim. (Ji cihê xwe tevnalîve.)

VLADIMIR: Lê... (Demek.) Çawan dibe ku... Ez hêvîdar im ez te aciz nakim.

ESTRAGON: Ez guhdarî nakim.

VLADIMIR: Çawan dibe ku ji çar hawariyan tenê yek bû-

yeran wilo dide? An na hersê jî li wir bûn: yanî, ne pirr dûr bûn. Û ji nav wan tenê yek behsa dizekî ku xelas bûye dike. (Demek.) Binêr, lê, Gogo, ger tu di nav re carna bipeyivî wê ne xerab be.

ESTRAGON: Ez guhdarî dikim.

VLADIMIR: Ji çaran yek. Dudu ji hersiyên din qet behsa vê yekê nakin, yê sisiyan jî dibêje ku herdiwên din ji dê û jina wî re xeberan didin.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Çawa?

ESTRAGON: Ez tişteki fêhm nakim... (Demek.) Ji dê û jina kê re xeberan didin?

VLADIMIR: Ji yên xelasker re.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku wî nexwest ew wan xelas bike.

ESTRAGON: Ji dogehê?

VLADIMIR: Çi munasebet canê min! Ji mirinê.

ESTRAGON: Çi bûye, baş e?

VLADIMIR: Wê çaxê divê herdu jî dogehê bin.

ESTRAGON: Ê?

VLADIMIR: Lê yê din dibêje, yek xelas bûye.

ESTRAGON: Çi bi vê heye? Dêmek eynî nêrînê neparêzin.

11

VLADIMIR: Herçar jî li wir bûn. Û yek ji wan behsa dizekî ku xelas bûye, dike. Çima bawerî bi yên din, lê bi wî têtêkirin?

ESTRAGON: Kî bawer dike?

VLADIMIR: Herkes, canê min. Tenê celebekî bûyerê têtê

zanîn.

ESTRAGON: Ji xwe hemû mirov xiyar in. (Bi hêz radibe ser xwe, bi qevzka ber bi kulîsa çepê ve dihere, radiweste, destê xwe dide ber çavên xwe, li dûr dinihêre, bi paş de vedigere, ber bi kulîsa rastê ve dihere, li dûr dinihêre. Vladimir li wî dinihêre, dihere solê ji erdê radike, li hundurê wê dinihêre, taviHdavêje.)

VLADIMIR: Ooo! (Tif dike erdê.)

(Estragon ber bi nava sehnê tê, li hêla fonê dinihêre.)

ESTRAGON: Cihekî pirr xweş e. (Bi paş ve vedigere, heta ber rampayê dimeşe, li hêla temaşevanan dinihêre.) Xuyayiyên dev bi ken. (Li Vladimir dizîvire.) Heydê, em êdî herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Tu bawer î ku ev der e?

VLADIMIR: Ku der?

ESTRAGON: Cihê rawestinê.

VLADIMIR: Li ber darê, got. (Li darê dinêrin.) Ma li vir tu darên din hene?

ESTRAGON: Daraçi?

VLADIMIR: Dişibe bîhê.

ESTRAGON: pelên wê li ku ne?

VLADIMIR: Pelên wê weşiyane.

12

VLADIMIR: Herçar jî li wir bûn. Û yek ji wan behsa dizekî

ku xelas bûye, dike. Çima bawerî bi yên din, lê bi wî têtêkirin?

ESTRAGON: Kî bawer dike?

VLADIMIR: Herkes, canê min. Tenê celebekî bûyerê têtê zanîn.

ESTRAGON: Ji xwe hemû mirov xiyar in. (Bi hêz radibe ser xwe, bi qevzka ber bi kulîsa çepê ve dihere, radiweste, destê xwe dide ber çavên xwe, li dûr dinihêre, bi paş de vedigere, ber bi kulîsa rastê ve dihere, li dûr dinihêre. Vladimir li wî dinihêre, dihere solê ji erdê radike, li hundurê wê dinihêre, taviHdavêje.)

VLADIMIR: Ooo! (Tif dike erdê.)

(Estragon ber bi nava sehnê têtê, li hêla fonê dinihêre.)

ESTRAGON: Cihekî pirr xweş e. (Bi paş ve vedigere, heta ber rampayê dimeşe, li hêla temaşevanan dinihêre.) Xuyayiyên dev bi ken. (Li Vladimir dizîvire.)

Heydê, em êdî herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Tu bawer î ku ev der e?

VLADIMIR: Ku der?

ESTRAGON: Cihê rawestinê.

VLADIMIR: Li ber darê, got. (Li darê dinêrin.) Ma li vir tu darên din hene?

ESTRAGON: Daraçi?

VLADIMIR: Dişibe bîhê.

ESTRAGON: pelên wê li ku ne?

VLADIMIR: Pelên wê weşiyane.

12

ESTRAGON: Hêsirê çavan sekinîne.

VLADIMIR: An jî li gor demsalê ye.

ESTRAGON: Ma ev şitlek e?

VLADIMIR: Derxek e.

ESTRAGON: Şitlek e.

VLADIMIR: Yek: (Bala xwe dide hev.) Çi di bin zimanê te

de ye? Ma tu dixwzî bêjî ku em li cihekî çewt in?

ESTRAGON: Gerek li vir bûya.

VLADIMIR: Ji sedî sed negot ku ez ê werime vir.

ESTRAGON: Lê ger neyê?

VLADIMIR: Em ê jî sibehê werin.

ESTRAGON: Paşê jî dusibe.

VLADIMIR: Kîdizane.

ESTRAGON: Ê wê wilo dom bike û here.

VLADIMIR: Yanî...

ESTRAGON: Heya ku ew were.

VLADIMIR: Tu pirr bêmerhemet î.

ESTRAGON: Em do jî hatibûn.

VLADIMIR: Ka bisekine, tu li wir ketî feqê.

ESTRAGON: Me do çi kir?

VLADIMIR: Te got, me do çi kir?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Çîk... (Hêrs dibe) Yekî wek te ku bikanibe tevliheviyê bike tune.

ESTRAGON: Ger bi min be, em dîsan li vir bûn.

VLADIMIR (/ / dora xwe bi xelekî dinihêre): Ma ev cih ji te re nas hat?

ESTRAGON: Min ew negot.

VLADIMIR: Lê?

ESTRAGON: Cardin dibe.

VLADIMIR: Lê yanî... ev dar... (1/ temaşevanan dizwire) ... ev kortala gû...

13

ESTRAGON: Hêsirê çavan sekinîne.

VLADIMIR: An jî li gor demsalê ye.

ESTRAGON: Ma ev şitlek e?

VLADIMIR: Derxek e.

ESTRAGON: Şitlek e.

VLADIMIR: Yek: (Bala xwe dide hev.) Çi di bin zimanê te de ye? Ma tu dixwzî bêjî ku em li cihekî çewt in?

ESTRAGON: Gerek li vir bûya.

VLADIMIR: Ji sedî sed negot ku ez ê werime vir.

ESTRAGON: Lê ger neyê?

VLADIMIR: Em ê jî sibehê werin.

ESTRAGON: Paşê jî dusibe.

VLADIMIR: Kîdizane.

ESTRAGON: Û wê wilo dom bike û here.

VLADIMIR: Yanî...

ESTRAGON: Heya ku ew were.

VLADIMIR: Tu pirr bêmerhemet î.

ESTRAGON: Em do jî hatibûn.

VLADIMIR: Ka bisekine, tu li wir ketî feqê.

ESTRAGON: Me do çî kir?

VLADIMIR: Te got, me do çi kir?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Çîk... (Hêrs dibe) Yekî wek te ku bikanibe tevliheviyê bike tune.

ESTRAGON: Ger bi min be, em dîsan li vir bûn.

VLADIMIR (// dora xwe bi xelekî dinihêre): Ma ev cih ji te re nas hat?

ESTRAGON: Min ew negot.

VLADIMIR: Lê?

ESTRAGON: Cardin dibe.

VLADIMIR: Lê yanî... ev dar... (1/ temaşevanan dizwire) ... ev kortala gû...

13

ESTRAGON: Ma tu bawer î ku îşev e?

VLADIMIR: A çi?

ESTRAGON: A ku em gerek li bendî bin.

VLADIMIR: Şemî, got. (Demek) bawer im.

ESTRAGON: Piştî kar.

VLADIMIR: Min li cihekî not nivîsandine. (Bêrîkên xwe yên ku tijî her texlît pîsî ye tev dide. )

ESTRAGON: Lê, kîjan şemî? Gelo ma şemî ye? Ji şemiyê bêtir îro ne yekşem be?

VLADIMIR (mîna ku dîrok li dîmenê hatibe nivîsandin, bi şaşmayî, gava li dora xwe dinihêre): bêîmkan e.

ESTRAGON: An jî pêncşemê.

VLADIMIR: Em ê çi bikin?

ESTRAGON: Ger ew do bi şev hatibe û em nedîtibe, ew ji xwe îro nayê.

VLADIMIR: Lê em do êvarî hatibûn, tu dibêjî.

ESTRAGON: Ez dikanim şaş bim. (Demek.) Ma em hinekî nepeyivin, hi, tu çi dibêjî?

VLADIMIR (bi dengê nîzim): Temam. (Estragon li erdê rûdine. Vladimir bi heyecan li ser sehnê diçe û tê, di nav re ji bo bi dîqet lê hûr bibe radiweste. Estragon radizê. Vladimir li ber Estragon radiweste.)

Gogo... (Bêdengî) Gogo... (Bêdengt) GOGO!  
(Estragon ji xew dipengize.)

ESTRAGON (Bi tirska ku ew bi carekê ve hişyar bû û li eynî cihê bû): Ez radizam. (Dipeke ser wt) Tu çima her tim min şiyar dikî?

VLADIMIR: Min xwe bi tenê hîs dikir.

ESTRAGON: Min xewnek dît.

VLADIMIR: Behs neke!

ESTRAGON: Min di xewna xwe de...

VLADIMIR: BEHS NEKE!

14

ESTRAGON: Ma tu bawer î ku îşev e?

VLADIMIR: A çi?

ESTRAGON: A ku em gerek li bendî bin.

VLADIMIR: Şemî, got. (Demek) bawer im.

ESTRAGON: Piştî kar.

VLADIMIR: Min li cihekî not nivîsandine. (Bêrîkên xwe yê ku tijî her texlît pîsî ye tev dide. )

ESTRAGON: Lê, kîjan şemî? Gelo ma şemî ye? Ji şemiyê bêtir îro ne yekşem be?

VLADIMIR (mîna ku dîrok li dîmenê hatibe nivîsandin, bi



şaşmayî, gava li dora xwe dinihêre): bêîmkan e.

ESTRAGON: An jî pêncşemê.

VLADIMIR: Em ê çi bikin?

ESTRAGON: Ger ew do bi şev hatibe û em nedîtibe, ew ji xwe îro nayê.

VLADIMIR: Lê em do êvarî hatibûn, tu dibêjî.

ESTRAGON: Ez dikanim şaş bim. (Demek.) Ma em hinekî nepeyivin, hi, tu çi dibêjî?

VLADIMIR (bi dengê nizam): Temam. (Estragon li erdê rûdine. Vladimir bi heyecan li ser sehnê diçe û tê, di nav re ji bo bi dîqet lê hûr bibe radiweste. Estragon radizê. Vladimir li ber Estragon radiweste.)

Gogo... (Bêdengî) Gogo... (Bêdengî) GOGO!

(Estragon ji xew dipengize.)

ESTRAGON (Bi tirska ku ew bi carekê ve hişyar bû û li eynî cihê bû): Ez radizam. (Dipeke ser wt) Tu çima her tim min şiyar dikî?

VLADIMIR: Min xwe bi tenê hîs dikir.

ESTRAGON: Min xewnek dît.

VLADIMIR: Behs neke!

ESTRAGON: Min di xewna xwe de...

VLADIMIR: BEHS NEKE!

14

ESTRAGON: (bi tevgerekê gerdûnê nîşan dide): Ev têra te dike? (Bêdengî.) Tu qet ne nazik î, Didi. Ma tu dixwazî ez kabûsên xwe yên şexsî ji te pê ve ji kê re behs bikim?

VLADIMIR: Bila şexsî bimînin. Tu dizanî ku ez xwe naspê-

rim wan.

ESTRAGON (bi sarî): Gelo em carna ji hev biqetin wê ne baş be, ez xwe bi xwe dipirsim.

VLADIMIR: Tu nikanî biçî dûr.

ESTRAGON: Nikanîbûna çûyina dûriyê bi rastî jî astengeke cidî ye. (Demek) Ma ne wilo ye, Didi, ev ne astengeke cidî ye? (Demek) Rê evqasî xweşik be.

(Demek.) Rêwî evqasî qenc bin. (Demek. Bi nazdarî) Ma ne wilo ye, Didi?

VLADIMIR: Sakîn be.

ESTRAGON (bi cinsî): Sakîn... sakîn... Ingilîz vê pirr xweş dibêjin, saaakîn, dibêjin. Ew mirovên saaakîn in.

(Demek.) Tu bi çîroka îngilîzê di kerxanê de dizanî?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ji min re behs bike.

VLADIMIR: Bes e.

ESTRAGON: îngilîzekî serxweş çûye kerxanê. Mama, tu yeka zer, esmer an jî porsor dixwazî? jê pirsî ye. Dom bike.

VLADIMIR: BES E!

(Vladimir derdikeve. Estragon radibe ser lingan, heya ji sehnê derdikeve ew li wî dinihêre. Mîmikên Estragonê ku Vladimirê li kûlêse temaşe dike, mîna mîmikên temaşevanên ku boksorekt li rtngê xurt dike, bi bîra mirov tîne. Vladimir bi paş ve tê, di ber Estragon re derbas dibe, di sehnê de di-  
15

ESTRAGON: (bi tevgerekê gerdûnê nîşan dide): Ev têra te

dike? (Bêdengî.) Tu qet ne nazik î, Didi. Ma tu dixwazî ez kabûsên xwe yên şexsî ji te pê ve ji kê re behs bikim?

VLADIMIR: Bila şexsî bimînin. Tu dizanî ku ez xwe naspêrim wan.

ESTRAGON (bi sarî): Gelo em carna ji hev biqetin wê ne baş be, ez xwe bi xwe dipirsim.

VLADIMIR: Tu nikanî biçî dûr.

ESTRAGON: Nikanîbûna çûyina dûriyê bi rastî jî astengeke cidî ye. (Demek) Ma ne wilo ye, Didi, ev ne astengeke cidî ye? (Demek) Rê evqasî xweşik be.

(Demek.) Rêwî evqasî qenc bin. (Demek. Bi nazdarî) Ma ne wilo ye, Didi?

VLADIMIR: Sakîn be.

ESTRAGON (bi cinsî): Sakîn... sakîn... Îngilîz vê pirr xweş dibêjin, saaakîn, dibêjin. Ew mirovên saaakîn in.

(Demek.) Tu bi çîroka îngilîzê di kerxanê de dizanî?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ji min re behs bike.

VLADIMIR: Bes e.

ESTRAGON: Îngilîzekî serxweş çûye kerxanê. Mama, tu yeka zer, esmer an jî porsor dixwazî? Jê pirsî ye. Dom bike.

VLADIMIR: BES E!

(Vladimir derdikeve. Estragon radibe ser lingan, heya ji sehnê derdikeve ew li wî dinihêre. Mîmikên Estragonê ku Vladimirê li kûlêse temaşe dike, mîna mîmikên temaşevanên ku boksorekt li rtngê

xurt dike, bi bîra mirov tîne. Vladimir bi paş ve têt, di ber Estragon re derbas dibe, di sehnê de di-  
15

meşe, ber bi jêr dinihêre. Estragon çend gavan ber bi wî ve davêje û disekine.)

ESTRAGON (bi nermî.): Ma te dixwest tu bi min re bipeyivî?  
(Vladimir bersiv nade. Estragon ber bi Vladimir ve gavekê davêje.) Bibêje, Didi...

VLADIMIR (rûyê xwe naguhere): Tu tiştêkî ku ez ji te re bibêjim tune ye.

ESTRAGON (gaveke din jî davêje.): Ma tu xeyidî yî? (Bêdengî. Gaveke din jî davêje.) Li min bibuhure.  
(Bêdengî. Gaveke din. Destê xwe datîne ser milê Vladimir.) Heydê, Didi. (Bêdengî) Destê xwe bide min! (Vladimir li wî dizîvire.) Min maçî bike!  
(Vladimir xwe bi paş ve dikişîne.) Xwe serbest berde! (Vladimir nerm dibe. Hevdu hemêz dikin û hevdu maçî dikin. Estragon xwe bi paş ve dikişîne.) Bêhneke genî ya sîrê ji te têt!

VLADIMIR: Ji bo gurçikan yeka yek e! (Bêdengî. Estragon bi dîqet li darê dinihêre.) Em ê niha çî bikin?

ESTRAGON: Em ê rawestin.

VLADIMIR: Erê, lê gava em radiwestin...

ESTRAGON: Ma em xwe bi dar ve bikin?

VLADIMIR: Ew jî celebekî tehemulê ye.

ESTRAGON: (di ber xwe de dikene): Ma em tehemul dikin?

VLADIMIR: Hem jî bi hemû awayî. Ma te pê nizanîbû?

ESTRAGON: Em hema xwe bi dar ve bikin.

VLADIMIR: Bi şaxekî ve? (Nêzîk dibin û li darê dinêrin.)

Ez bawer nakim.

ESTRAGON: Em dîsan dikanin biceribînin.

VLADIMIR: Tu biceribîne.

ESTRAGON: Pêşî tu.

VLADIMIR: Na, pêşî tu.

16

meşe, ber bi jêr dinihêre. Estragon çend gavan ber bi wî ve davêje û disekine.)

ESTRAGON (bi nermî.): Ma te dixwest tu bi min re bipeyivî?

(Vladimir bersiv nade. Estragon ber bi Vladimir ve gavekê davêje.) Bibêje, Didi...

VLADIMIR (rûyê xwe naguhere): Tu tiştêkî ku ez ji te re bibêjim tune ye.

ESTRAGON (gaveke din jî davêje.): Ma tu xeyidî yî? (Bêdengî. Gaveke din jî davêje.) Li min bibuhure.

(Bêdengî. Gaveke din. Destê xwe datîne ser milê Vladimir.) Heydê, Didi. (Bêdengî) Destê xwe bide min! (Vladimir li wî dizîvire.) Min maçî bike!

(Vladimir xwe bi paş ve dikişîne.) Xwe serbest berde! (Vladimir nerm dibe. Hevdu hemêz dikan û hevdu maçî dikan. Estragon xwe bi paş ve dikişîne.) Bêhneke genî ya sîrê ji te tê!

VLADIMIR: Ji bo gurçikan yeka yek e! (Bêdengî. Estragon bi dîqet li darê dinihêre.) Em ê niha çî bikin?

ESTRAGON: Em ê rawestin.

VLADIMIR: Erê, lê gava em radiwestin...

ESTRAGON: Ma em xwe bi dar ve bikin?

VLADIMIR: Ew jî celebekî tehemulê ye.

ESTRAGON: (di ber xwe de dikene): Ma em tehemul dikin?

VLADIMIR: Hem jî bi hemû awayî. Ma te pê nizanîbû?

ESTRAGON: Em hema xwe bi dar ve bikin.

VLADIMIR: Bi şaxekî ve? (Nêzîk dibin û li darê dinêrin.)

Ez bawer nakim.

ESTRAGON: Em dîsan dikanin biceribînin.

VLADIMIR: Tu biceribîne.

ESTRAGON: Pêşî tu.

VLADIMIR: Na, pêşî tu.

16

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku tu ji min siviktir î.

ESTRAGON: Baştir e.

VLADIMIR: Min fêhm nekir.

ESTRAGON: Hebekî bifikire.

(Vladimir difikire.)

VLADIMIR (paşê): Min fêhm nekir.

ESTRAGON: Guh bide min ez ji te re behs bikim. (Difikire.)

Şax... şax... (Bi hêrs) hewl bide fêhm bike!

VLADIMIR: Hemû hêviya min tu î.

ESTRAGON: (hewl dide): Gogo sivik: şax tune şikandin:

Gogo mir. Didi giran: şax şikandin: Didi tenê.

(Demek) Ewko...(Li gotina rast digere.)

VLADIMIR: Ez li vê nefikirî bûm.

ESTRAGON (dibîne): Sivikê ku giran dikişine, de heydê.

VLADIMIR: Çima ez ji te girantir dibim?

ESTRAGON: Tu wilo dibêjî. Ez çi zanim. Carna şans heye.

An jî teqrîben.

VLADIMIR: Wê çaxê em çi bikin?

ESTRAGON: Em tiştê nekin. Wilo bêtir bi bawerî ye.

VLADIMIR: Em li bendî bin ka bê ew ê ji me re çi bibêje.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Godot.

ESTRAGON: Temam.

VLADIMIR: Em li benda ronahîkirina rewşê rawestin.

ESTRAGON: Ji aliyê din ve jî, belkî her tişt di wextê xwe de çêtir e. VLADIMIR: Ez meraq dikim bê ew ê ji me re çi bibêje.

Guhdarîkirin me girê nade.

ESTRAGON: Me ji wî tam çi xwestibû?

VLADIMIR: Ma tu ne li wir bûyî?

ESTRAGON: Min bala xwe nedayê.

17

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku tu ji min siviktir î.

ESTRAGON: Baştir e.

VLADIMIR: Min fêhm nekir.

ESTRAGON: Hebekî bifikire.

(Vladimir difikire.)

VLADIMIR (paşê): Min fêhm nekir.

ESTRAGON: Guh bide min ez ji te re behs bikim. (Difikire.)

Şax... şax... (Bi hêrs) hewl bide fêhm bike!

VLADIMIR: Hemû hêviya min tu î.

ESTRAGON: (hewl dide): Gogo sivik: şax tune şikandin:

Gogo mir. Didi giran: şax şikandin: Didi tenê.

(Demek) Ewko...(Li gotina rast digere.)

VLADIMIR: Ez li vê nefikirî bûm.

ESTRAGON (dibîne): Sivikê ku giran dikişine, de heydê.

VLADIMIR: Çima ez ji te girantir dibim?

ESTRAGON: Tu wilo dibêjî. Ez çî zanim. Carna şans heye.  
An jî teqrîben.

VLADIMIR: Wê çaxê em çî bikin?

ESTRAGON: Em tiştê nekin. Wilo bêtir bi bawerî ye.

VLADIMIR: Em li bendî bin ka bê ew ê ji me re çî bibêje.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Godot.

ESTRAGON: Temam.

VLADIMIR: Em li benda ronahîkirina rewşê rawestin.

ESTRAGON: Ji aliyê din ve jî, belkî her tişt di wextê xwe  
de çêtir e. VLADIMIR: Ez meraq dikim bê ew ê ji me re çî bibêje.  
Guhdarîkirin me girê nade.

ESTRAGON: Me ji wî tam çî xwestibû?

VLADIMIR: Ma tu ne li wir bûyî?

ESTRAGON: Min bala xwe nedayê.

17

VLADIMIR: Çîk... Me tiştê vekirî nexwestiye.

ESTRAGON: Celebekî lavakirinê bû.

VLADIMIR: Wilo ye.

ESTRAGON: Xwestekek ne xuyayî.

VLADIMIR: Mirov kane wilo jî bibêje.

ESTRAGON: Wî çawan bersiv da?

VLADIMIR: Ew ê binêre.

ESTRAGON: Ew nikane ji tiştê re sozê bide.

VLADIMIR: Ew ê bifikire.



ESTRAGON: Bi seriyekî sakîn.

VLADIMIR: Ew ê bi malbata xwe bişêwire.

ESTRAGON: Ew ê bi dostên xwe bişêwire.

VLADIMIR: Bi peyayên xwe.

ESTRAGON: Bi nivîsên xwe.

VLADIMIR: Bi defterên xwe.

ESTRAGON: Bi hesabên xwe yê bankê.

VLADIMIR: Berî ku ew bersiv bide ew ê binêre.

ESTRAGON: Xwezayî ye.

VLADIMIR: Ne wilo?

ESTRAGON: Bi min wilo ye.

VLADIMIR: Bi min jî.

(Rawestandin.)

ESTRAGON (bi xemgînî.): Lê em?

VLADIMIR: Libê?

ESTRAGON: Lê em? min got.

VLADIMIR: Min fêhm nekir.

ESTRAGON: Di vê de rola me çi ye?

VLADIMIR: Rola me?

ESTRAGON: Ne hewce ye tu tavilê bersiv bidî. Wextê te gelek e.

VLADIMIR: Te got rola me çi ye? Rola me lavakirin e.

ESTRAGON: Tenê ewqas e?

18

VLADIMIR: Çîk... Me tiştêkî vekirî nexwestiye.

ESTRAGON: Celebekî lavakirinê bû.

VLADIMIR: Wilo ye.

ESTRAGON: Xwestekê ne xuyayî.

VLADIMIR: Mirov kane wilo jî bibêje.  
ESTRAGON: Wî çawan bersiv da?  
VLADIMIR: Ew ê binêre.  
ESTRAGON: Ew nikane ji tiştê re sozê bide.  
VLADIMIR: Ew ê bifikire.  
ESTRAGON: Bi seriyekî sakîn.  
VLADIMIR: Ew ê bi malbata xwe bişêwire.  
ESTRAGON: Ew ê bi dostên xwe bişêwire.  
VLADIMIR: Bi peyayên xwe.  
ESTRAGON: Bi nivîsên xwe.  
VLADIMIR: Bi defterên xwe.  
ESTRAGON: Bi hesabên xwe yên bankê.  
VLADIMIR: Berî ku ew bersiv bide ew ê binêre.  
ESTRAGON: Xwezayî ye.  
VLADIMIR: Ne wilo?  
ESTRAGON: Bi min wilo ye.  
VLADIMIR: Bi min jî.  
(Rawestandin.)  
ESTRAGON (bi xemgînî.): Lê em?  
VLADIMIR: Libê?  
ESTRAGON: Lê em? min got.  
VLADIMIR: Min fêhm nekir.  
ESTRAGON: Di vê de rola me çi ye?  
VLADIMIR: Rola me?  
ESTRAGON: Ne hewce ye tu tavilê bersiv bidî. Wextê te gelek e.  
VLADIMIR: Te got rola me çi ye? Rola me lavakirin e.  
ESTRAGON: Tenê ewqas e?

18

VLADIMIR: Ma beg efendî neeciband?

ESTRAGON: Ma qey heqê min tune ye?

(Vladimir dikene û mîna berê tavilê disekine. Eynî hereketan dike, lê nabişire.)

VLADIMIR: Ger destûra min a ken hebûya, ez ê bi rewşa te bikeniyama.

ESTRAGON: Ma me heqê xwe winda kiriye?

VLADIMIR (bi biryar): Me hemû da xwendin. (Bêdengî.)

Milên wan bi wan ve daliqayî, serên wan dakerine ser sîngên wan, çongên wan sist, bêtevger rawestiya ne.

ESTRAGON (bi hêdîka): Em ne girêdayî ne, ne wilo? (Demek.)  
Hê?

VLADIMIR (destê xwe bilind dike): Guhdarî bike!

(Di rewşeke pêkenîn de bi sarî radiwestin û guhdarîdikin.)

ESTRAGON: Ez tiştê nabihîzim.

VLADIMIR: Şşşt! (guhdarî dike. Estragon denga xwe winda dike û dike bikeve. Gava xwe bi milê Vladimir digire, ew jî dişewişe. Ew bi hev ve dizeliqin, çavên wan di çavên hevdu de, guhdarî dikan.)  
Ez jî nabihîzim. (Bi rehetî bêhna xwe digirin û berdidin, sist dibin. Ji hev vediqetin. )

ESTRAGON: Te ez tirsandim.

VLADIMIR: Min texmîn kir ku ew ê bê.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Godot.

ESTRAGON: Hih! Bayê delavgiyan bû.

VLADIMIR: Mîna ku min dengê qîjeqîjan bihîst.

ESTRAGON: Çima ew ê biqîjin ku?

VLADIMIR: Ji bo bang hespê xwe bike.

(Bêdengî.)

19

VLADIMIR: Ma beg efendî neeciband?

ESTRAGON: Ma qey heqê min tune ye?

(Vladimir dikene û mîna berê tavilê disekine. Eynî hereketan dike, lê nabişire.)

VLADIMIR: Ger destûra min a ken hebûya, ez ê bi rewşa te bikeniyama.

ESTRAGON: Ma me heqê xwe winda kiriye?

VLADIMIR (bi biryar): Me hemû da xwendin. (Bêdengî.)

Milên wan bi wan ve daliqayî, serên wan dakerine ser sîngên wan, çongên wan sist, bêtevger rawestiya ne.

ESTRAGON (bi hêdîka): Em ne girêdayî ne, ne wilo? (Demek.) Hê?

VLADIMIR (destê xwe bilind dike): Guhdarî bike!

(Di rewşeke pêkenîn de bi sarî radiwestin û guhdarîdikin.)

ESTRAGON: Ez tişteki nabihîzim.

VLADIMIR: Şşşt! (guhdarî dike. Estragon denga xwe winda dike û dike bikeve. Gava xwe bi milê Vladimir digire, ew jî dişewişe. Ew bi hev ve dizeliqin, çavên wan di çavên hevdu de, guhdarî dikin.)

Ez jî nabihîzim. (Bi rehetî bêhna xwe digirin û berdidin, sist dibin. Ji hev vediqetin. )

ESTRAGON: Te ez tirsandim.

VLADIMIR: Min texmîn kir ku ew ê bê.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Godot.

ESTRAGON: Hih! Bayê delavgiyan bû.

VLADIMIR: Mîna ku min dengê qîjeqîjan bihîst.

ESTRAGON: Çima ew ê biqîjin ku?

VLADIMIR: Ji bo bang hespê xwe bike.

(Bêdengî.)

19

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Herin ku? (Demekê.) Belkî em îşev li mala wî bi ziktêrî, rehetî û xweşî li ser kayê rakevin. Li benda qîmet bin, ne wilo?

ESTRAGON: Ne hemû şevê.

VLADIMIR: Hê ro ye.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ez bîrçî bûme.

VLADIMIR: Ma tu gêzeran dixwazî?

ESTRAGON: Tişteki din tune ye?

VLADIMIR: Wê çend şêlim hebin.

ESTRAGON: Gêzeran bide. (Vladimir bêrîkên xwe tevdide, şêlimekê derdixe û dide Estragon.) Spas. (Dev li şêlimê dike. Bi gilî) Ev şêlim e!

VLADIMIR: Oh, bibuhure! Min got belkî gêzer e. (Ew dîsan bêrîkên xwe tevdide, ji bêrîkên wî bi tenê şêlim derdikevin.) Ev hemû şêlim e. (Ew her digere.) Herhal te gêzera dawî jî xwariye. (Digere.) Raweste, min dît. (Dawî dawî gêzerekê ji bêrîka xwe

derdixe û dide Estragon.) Ha ji te re, dostê min ê delal. (Estragon gêzerî bi milên çakêtê xwe pakij dike û dest pê dike dixwe.) Şêlimê bide min. (Estragon şêlimê bi paş ve dide.) Tu hema xelas nekî, ji wê pê ve nema ye.

ESTRAGON (Bi cûtinê re): Min pirsê ji te pirsê bû.

VLADIMIR: Hi.

ESTRAGON: Ma te bersivandibû?

VLADIMIR: Gêzerê te xweş e?

ESTRAGON: Şêrîn e.

VLADIMIR: Baştir e, baştir e. (Demek.) Te dixwest tu çî fêr bibî?

ESTRAGON: Min ji bîr kir. (Dicû.) Ya ku min aciz dike jî

20

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Herin ku? (Demekê.) Belkî em îşev li mala wî bi ziktêrî, rehetî û xweşî li ser kayê rakevin. Li benda qîmet bin, ne wilo?

ESTRAGON: Ne hemû şevê.

VLADIMIR: Hê ro ye.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ez bîrçî bûme.

VLADIMIR: Ma tu gêzeran dixwazî?

ESTRAGON: Tiştêkî din tune ye?

VLADIMIR: Wê çend şêlim hebin.

ESTRAGON: Gêzeran bide. (Vladimir bêrîkên xwe tevdide, şêlimekê derdixe û dide Estragon.) Spas. (Dev li şêlimê dike. Bi gilî) Ev şêlim e!

VLADIMIR: Oh, bibuhure! Min got belkî gêzer e. (Ew dîsan bêrikên xwe tevdide, ji bêrikên wî bi tenê şêlim derdikevin.) Ev hemû şêlim e. (Ew her digere.) Herhal te gêzera dawî jî xwariye. (Digere.) Raweste, min dît. (Dawî dawî gêzerekê ji bêrika xwe derdixe û dide Estragon.) Ha ji te re, dostê min ê delal. (Estragon gêzerî bi milên çakêtê xwe pakij dike û dest pê dike dixwe.) Şêlimê bide min. (Estragon şêlimê bi paş ve dide.) Tu hema xelas nekî, ji wê pê ve nema ye.

ESTRAGON (Bi cûtinê re): Min pirsek ji te pirsî bû.

VLADIMIR: Hi.

ESTRAGON: Ma te bersivandibû?

VLADIMIR: Gêzerê te xweş e?

ESTRAGON: Şêrîn e.

VLADIMIR: Baştir e, baştir e. (Demek.) Te dixwest tu çi fêr bibî?

ESTRAGON: Min ji bîr kir. (Dicû.) Ya ku min aciz dike jî  
20

ev e. (Bi heyranî li gêzer dinihêre, gêzer li ser tiliya xwe, li hewa dizizikîne. Gêzerê te pirr bi lezet e. (Di nava ramanan de serê gêzer dimêje.) Bisekine, tê bîra min. (Qertekêjê dike.)

VLADIMIR: Êêêê?

ESTRAGON (dev tijî, bi xayizt): Ma em ne girêdayî ne?

VLADIMIR: Ez tiştêkî fêhm nakim.

ESTRAGON (dicû û dadiqurtîne.): Ma em girêdayî ne, ez dipirsim.

VLADIMIR: Girêdayî?

ESTRAGON: Giredayî.

VLADIMIR: Çawa girêdayî?

ESTRAGON: Em bi dest û lingên xwe ve girêdayî ne.

VLADIMIR: Lê em bi kê ve girêdayî ne? Kê em girê dane?

ESTRAGON: Bi zilamê te ve.

VLADIMIR: Bi Godot ve? Em bi Godot ve girêdayî ne? Ew ji ku derket! Ma hîç wilo çêdibe! (Demek) Hîna na. ESTRAGON: Ma navê wî Godot ye?

VLADIMIR: Ez bawer im.

ESTRAGON: Bala xwe bidê! (Bi hêla qalind ya gêzer digire, û li ber çavên xwe dizîvirîne.) Ecêb, her ku diçe bêtam dibe.

VLADIMIR: Ji bo min berevajiyê wê ye.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Ez her ku dixwim tama wê bi min xweş dibe.

ESTRAGON (Piştî ku demek dirêj difikire): Ma berevajiya wê wilo dibe?

VLADIMIR: Li gorî kesan dikare bête guhertin.

ESTRAGON: Li gorî kesiyetan.

VLADIMIR: Tu ê çi bikî?

ESTRAGON: Heya ji te bê tu biperpîte.

21

ev e. (Bi heyranî li gêzer dînehêre, gêzer li ser tiliya xwe, li hewa dizizikîne. Gêzerê te pirr bi lezet e.

(Di nava ramanan de serê gêzer dimêje.) Bisekine, tê bîra min. (Qertekêjê dike.)

VLADIMIR: Êêêê?



ESTRAGON (dev tijî, bi xayizt): Ma em ne girêdayî ne?

VLADIMIR: Ez tişteki fêhm nakim.

ESTRAGON (dicû û dadiqurtîne.): Ma em girêdayî ne, ez dipirsim.

VLADIMIR: Girêdayî?

ESTRAGON: Giredayî.

VLADIMIR: Çawa girêdayî?

ESTRAGON: Em bi dest û lingên xwe ve girêdayî ne.

VLADIMIR: Lê em bi kê ve girêdayî ne? Kê em girê dane?

ESTRAGON: Bi zîlamê te ve.

VLADIMIR: Bi Godot ve? Em bi Godot ve girêdayî ne? Ew ji ku derket! Ma hîç wilo çêdibe! (Demek) Hîna na. ESTRAGON: Ma navê wî Godot ye?

VLADIMIR: Ez bawer im.

ESTRAGON: Bala xwe bidê! (Bi hêla qalind ya gêzer digire, û li ber çavên xwe dizivirîne.) Ecêb, her ku diçe bêtam dibe.

VLADIMIR: Ji bo min berevajiyê wê ye.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Ez her ku dixwim tama wê bi min xweş dibe.

ESTRAGON (Piştî ku demek dirêj difikire): Ma berevajiya wê wilo dibe?

VLADIMIR: Li gorî kesan dikare bête guhertin.

ESTRAGON: Li gorî kesiyetan.

VLADIMIR: Tu ê çi bikî?

ESTRAGON: Heya ji te bê tu biperpîte.

21

VLADIMIR: Yê bi xû ji xûyê xwe nagere.

ESTRAGON: Heta ku tu dixwazî xwe biqeherîne.

VLADIMIR: Ruh diçe xû naçe.

ESTRAGON: Çi ji destên me tê. (Gêzerê xwe bilind dike, dirêjî Vladimir dike.) Tu dixwazî xelas bikî?

(Tam di vê navê de, dengê qîrînekê ji pirr nêzîk ve tê. Gêzerê Estragon ji destê wî dikeve. Ew di cihên xwe de sar dimînin, paşê ber bi kûlîsê ve direvin.

Estragon ji nîvê rê bi paş de vedigere, gêzerê xwe ji erdê radike, dixê bêrîka xwe, ber bi Vladimirê ku li benda wî bû direve, dîsan disekine, bi paş de vedigere, sola xwe ji erdê radike, paşê bi bazdan tê ba Vladimir. Ew hevdu hemêz dikan, serê wan li ser milên hevdu, piştên xwe didin tehlûkê û radiwestin.

Pozzo û Lucky dikevin hundur. Pozzo benek xistiye stûyê Lucky û wî îdare dike. Wilo ku pêşî Lucky, paşê jî ben dixuye; ben, bi qasî ku Lucky gihîşte nava sehnê dirêj bû. Lucky çentakî giran, kursiyeye ku tê vekirin û girtin, paltoyek lê ye û selikeke xwarinê hilgirtiyê; di destê Pozzo de jî qemçiyek heye.)

POZZO (ji kûlîsê): Hîn xurttir! (Dengê qemçî. Pozzo tê. Di sehnê de derbas dibin. Lucky, Vladimir û Estragon di pêşiyê de dimeşin û derdikevin. Pozzo, Vladimir û Estragon dibhie, disekine. Ben dişide.

Pozzo xwe bi ben ve dadiliqîne.) Bi paş de here! (Di kûlîsê de dengê ketinê tê. Lucky bi hemû barê xwe ketiyê xwarê. Vladimir û Estragon di navbera

xwesteka çûyina alîkariya wan û tirsî têkiliya  
tiştê ku wan eleqeder nake de bi bêbiryarî li wan  
dinihêre. Vladimir gavekê ber bi Lucky ve diavêje,  
22

VLADIMIR: Yê bi xû ji xûyê xwe nagere.

ESTRAGON: Heta ku tu dixwazî xwe biqehêrîne.

VLADIMIR: Ruh diçe xû naçe.

ESTRAGON: Çi ji destên me tê. (Gêzerê xwe bilind dike,  
dirêjî Vladimir dike.) Tu dixwazî xelas bikî?

(Tam di vê navê de, dengê qîrînekê ji pirr nêzîk ve  
tê. Gêzerê Estragon ji destê wî dikeve. Ew di cihên  
xwe de sar dimînin, paşê ber bi kûlîsê ve direvin.

Estragon ji nîvê rê bi paş de vedigere, gêzerê  
xwe ji erdê radike, dixê bêrîka xwe, ber bi Vladimirê  
ku li benda wî bû direve, dîsan disekine, bi  
paş de vedigere, sola xwe ji erdê radike, paşê bi  
bazdan tê ba Vladimir. Ew hevdu hemêz dikan, serê  
wan li ser milên hevdu, piştên xwe didin tehlû-  
kê û radiwestin.

Pozzo û Lucky dikevin hundur. Pozzo benek xistiye  
stûyê Lucky û wî îdare dike. Wilo ku pêşî  
Lucky, paşê jî ben dixuye; ben, bi qasî ku Lucky  
gihîşte nava sehnê dirêj bû. Lucky çentakî giran,  
kursiyeke ku tê vekirin û girtin, paltoyek lê ye û  
selikeke xwarinê hilgirtiye; di destê Pozzo de jî qemçiyek  
heye.)

POZZO (ji kûlîsê): Hîn xurttir! (Dengê qemçî. Pozzo tê. Di  
sehnê de derbas dibin. Lucky, Vladimir û Estragon

di pêşiyê de dimeşin û derdikevin. Pozzo, Vladimir  
û Estragon dibhie, disekine. Ben dişide.

Pozzo xwe bi ben ve dadiliqîne.) Bi paş de here!  
(Di kûlîsê de dengê ketinê tê. Lucky bi hemû barê  
xwe ketiye xwarê. Vladimir û Estragon di navbera  
xwesteka çûyina alîkariya wan û tirsê tîkiliya  
tiştê ku wan eleqeder nake de bi bêbiryarî li wan  
dinihêre. Vladimir gavekê ber bi Lucky ve diavêje,  
22

Estragon bi milê wîdigire.)

VLADIMIR: Min berde!

ESTRAGON: Bihêle!

POZZO: Bi dîqet be! Ew dikare êrîş bike! (Estragon û Vladimir  
li wî dinêrin. ) Ji biyaniyan re.

ESTRAGON (bi dengê nizim): Ew e?

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: De tu dizanî...

VLADIMIR: Godot?

ESTRAGON: Erê.

POZZO: Ez xwe bi we bidime naskirin: ez Pozzo.

VLADIMIR: Ew ji ku derket?

ESTRAGON: Godot, got.

VLADIMIR: Ew jî ji ku derket?

ESTRAGON (ji Pozzo re): Ma tu ne Mîrza Godot yî?

POZZO (bi dengê bi tirs): Ez Pozzo me! (Bêdengî.) Ma ev  
nav tiştêkî nayîne bîra we? (Bêdengî.) Ev nav tiştêkî  
di bîra we de nayne, min got. (Vladimir û Estragon  
bi serên xwe ji hev dipirsin. )

ESTRAGON (Mîna ku tîne btra xwe): Bozzo... Bozzo...

VLADIMIR (eynî): Pozzo...

POZZO: PPPOZZO!

ESTRAGON: Ha! Pozzo... ka raweste... Pozzo...

VLADIMIR: Pozzo, an Bozzo?

ESTRAGON: Pozzo... na, nayê bîra min.

VLADIMIR (dixwaze karê xwe bi xweşî bike): Min demekê malbateke Gozzo nas kir. Dayikê gergef çêdikir.

(Pozzo, bi tirs dimeşe ser wan.)

ESTRAGON (zûka.) Em ne ji vir in, bira.

POZZO (radiweste.): Lêbelê hûn mirov in. (Berçavikên xwe dide ber çavên xwe.) Wilo dixuye. (Berçavikên xwe derdixe.) Eynî ji cinsê min. (Kenekt ecêb di-

23

Estragon bi milê wîdigire.)

VLADIMIR: Min berde!

ESTRAGON: Bihêle!

POZZO: Bi dîqet be! Ew dikare êrîş bike! (Estragon û Vladimir li wî dinêrin. ) Ji biyaniyan re.

ESTRAGON (bi dengê nizim): Ew e?

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: De tu dizanî...

VLADIMIR: Godot?

ESTRAGON: Erê.

POZZO: Ez xwe bi we bidime naskirin: ez Pozzo.

VLADIMIR: Ew ji ku derket?

ESTRAGON: Godot, got.

VLADIMIR: Ew jî ji ku derket?

ESTRAGON (ji Pozzo re): Ma tu ne Mîrza Godot yî?

POZZO (bi dengekî bi tirs): Ez Pozzo me! (Bêdengî.) Ma ev nav tişteki nayîne bîra we? (Bêdengî.) Ev nav tişteki di bîra we de nayne, min got. (Vladimir û Estragon bi serên xwe ji hev dipirsin. )

ESTRAGON (Mîna ku tîne bîra xwe): Bozzo... Bozzo...

VLADIMIR (eynî): Pozzo...

POZZO: PPOZZO!

ESTRAGON: Ha! Pozzo... ka raweste... Pozzo...

VLADIMIR: Pozzo, an Bozzo?

ESTRAGON: Pozzo... na, nayê bîra min.

VLADIMIR (dixwaze karê xwe bi xweşî bike): Min demekê malbateke Gozzo nas kir. Dayikê gergef çêdikir. (Pozzo, bi tirs dimeşe ser wan.)

ESTRAGON (zûka.) Em ne ji vir in, bira.

POZZO (radiweste.): Lêbelê hûn mirov in. (Berçavikên xwe dide ber çavên xwe.) Wilo dixuye. (Berçavikên xwe derdixe.) Eynî ji cinsê min. (Kenekt ecêb di-

23  
ke.) Eynî ji cinsê Pozzo. Ji reha Xwedayî!

VLADIMIR: Binêrin...

POZZO (bê ku gotinê di devê xwe de bibe û bîne): Godot kîye?

ESTRAGON: Godot?

POZZO: We texmîn kir ku ez Godot me ya?

VLADIMIR: Tu vê yekê ji ku derdixî, begê min, çi munasebet.

POZZO: Ew kî ye?

VLADIMIR: Baş e, ew yek kî ye... ew yekî nas e.

ESTRAGON: Ne tam, em wî baş nas nakin.

VLADIMIR: Wilo ye... em wî baş nas nakin... Perçakî...

ESTRAGON: Ez bi xwe jî bibînim ez nas nakim.

POZZO: Lê we texmîn kir ku ez ew im.

ESTRAGON: Yanî... tarîtî... betilîbûn... bêhêzî... bendemayîn...  
ez mikur têm ku... demek... min texmîn kir  
ku...

VLADIMIR: Tu guh mede wî, bira, guh mede wî!

POZZO: Te got li bendemayîn? Dêmek hûn li benda wî ne?

VLADIMIR: Çîk...

POZZO: Ma li vir? Li ser erdên min?

VLADIMIR: Niyeteke me ya ne pak tune bû.

ESTRAGON: Ew niyetpak bû.

POZZO: Rê ya her kesî ye.

VLADIMIR: Min jî ew digot.

ESTRAGON: Me jî ji hev re ew digot.

POZZO: Ev şermazariyek e, lê mixabin wilo ye.

ESTRAGON: Hûn ê çi bikin.

POZZO (hereketek fireh dike): Em êdî behsa vê nekin.

(Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Rabe ser xwe! (Demek.)

Bi her ketinê re di xew re diçe. (Xwe bi ben  
ve dadiliqîne.) Rabe ser xwe, genî! (Dengê Luckyê

24

ke.) Eynî ji cinsê Pozzo. Ji reha Xwedayî!

VLADIMIR: Binêrin...

POZZO (bê ku gotinê di devê xwe de bibe û bîne): Godot  
kîye?

ESTRAGON: Godot?

POZZO: We texmîn kir ku ez Godot me ya?

VLADIMIR: Tu vê yekê ji ku derdixî, begê min, çi munasebet.

POZZO: Ew kî ye?

VLADIMIR: Baş e, ew yek kî ye... ew yekî nas e.

ESTRAGON: Ne tam, em wî baş nas nakin.

VLADIMIR: Wilo ye... em wî baş nas nakin... Perçakî...

ESTRAGON: Ez bi xwe jî bibînim ez nas nakim.

POZZO: Lê we texmîn kir ku ez ew im.

ESTRAGON: Yanî... tarîti... betilîbûn... bêhêzî... bendemayîn...  
ez mikur tîm ku... demek... min texmîn kir  
ku...

VLADIMIR: Tu guh mede wî, bira, guh mede wî!

POZZO: Te got li bendemayîn? Dêmek hûn li benda wî ne?

VLADIMIR: Çik...

POZZO: Ma li vir? Li ser erdên min?

VLADIMIR: Niyeteke me ya ne pak tune bû.

ESTRAGON: Ew niyetpak bû.

POZZO: Rê ya her kesî ye.

VLADIMIR: Min jî ew digot.

ESTRAGON: Me jî ji hev re ew digot.

POZZO: Ev şermazariyek e, lê mixabin wilo ye.

ESTRAGON: Hûn ê çi bikin.

POZZO (hereketek fireh dike): Em êdî behsa vê nekin.

(Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Rabe ser xwe! (Demek.)

Bi her ketinê re di xew re diçe. (Xwe bi ben

ve dadiliqîne.) Rabe ser xwe, genî! (Dengê Luckyê

24

ku radibe ser xwe û dengê hevdana alavên ku



wî xistibûn tê bihîstin. Pozzo xwe bi ben ve dadiliqîne.)  
Bi paş ve bikişîne! (Lucky berepaş dimeşe  
û diçe.) Raweste! (Lucky radiweste.) Bizîvire!  
(Lucky bi paş de dizîvire. Mîna ku ew dixwaze dilê  
Vladimir û Estragon xweş bike.) Dostên min, ji  
bo ku ez pêrgî we hatime ez gelekî dilşa me. (Gava  
ew awirên bêbawerî dibîne.) Erê, ez wilo me,  
ez dil şa me. (Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Hê nêzîk!  
(Lucky bi pêş ve tê.) Raweste! (Lucky radiweste.  
Ji Vladimir û Estragon re.) Hûn ê çî bikin, gava  
mirov bi tenê rêwîtiyê bike, rê bi mirov dirêj tê.  
(Li saeta xwe dinihêre.)... dirêj tê... (dihesibîne) ... şeş saet, erê,  
tam şeş saet, bê rawestan, bê ku  
pêrgî kesî were. (Ji Lucky re.) Palto! (Lucky baholê  
datîne erdê. Bi pêş ve tê, palto didiyê, bi paş ve  
diçe, baholê ji erdê radike.) Rahije vê. (Pozzo qê-  
mçî dirêjî wî dike, Lucky bi pêş ve diçe, ji ber ku  
destên wî tijî ne, ew daqûl dibe, bi diranên xwe  
radihîje qemçî, paşê diçe cihê xwe. Pozzo hewl dide  
ku paltoyê xwe li xwe bike, radiweste.) Palto!  
(Lucky her tiştî datîne erdê, bi pêş ve diçe, alîkariya  
Pozzo dike da ew paltoyê xwe li xwe bike, dizîvire  
cihê xwe, alavên xwe ji erdê dide hev.) Hewa  
hênik dibe. (Bişkokên paltoyê xwe digire, daqûl  
dibe, xwe diedilîne, xwe rast dike) Qemçî!  
(Lucky bi pêş de diçe, xwe daqûl dike, Pozzo qemçîji  
dev dikişîne, Lucky diçe cihê xwe.) Hûn dibînin,  
dostino, ez nikanim demeke dirêj ji hevcinsên

xwe bi dûr bimînim (// dû hevcinsên xwe dinihêre)  
qet nebe hema hebekî jî li min biçûna. (Ji  
Lucky re.) Kursî! (Lucky bahol û selikê datîne er-  
25

ku radibe ser xwe û dengê hevdana alavên ku  
wî xistibûn tê bihîstin. Pozzo xwe bi ben ve dadiliqîne.)  
Bi paş ve bikişîne! (Lucky berepaş dimeşe  
û diçe.) Raweste! (Lucky radiweste.) Bizîvire!  
(Lucky bi paş de dizîvire. Mîna ku ew dixwaze dilê  
Vladimir û Estragon xweş bike.) Dostên min, ji  
bo ku ez pêrgî we hatime ez gelekî dilşa me. (Gava  
ew awirên bêbawerî dibîne.) Erê, ez wilo me,  
ez dil şa me. (Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Hê nêzîk!  
(Lucky bi pêş ve tê.) Raweste! (Lucky radiweste.  
Ji Vladimir û Estragon re.) Hûn ê çî bikin, gava  
mirov bi tenê rêwîtiyê bike, rê bi mirov dirêj tê.  
(Li saeta xwe dinihêre.)... dirêj tê... (dihesibîne) ... şeş saet, erê,  
tam şeş saet, bêî rawestan, bêî ku  
pêrgî kesî were. (Ji Lucky re.) Palto! (Lucky baholê  
datîne erdê. Bi pêş ve tê, palto didiyê, bi paş ve  
diçe, baholê ji erdê radike.) Rahije vê. (Pozzo qê-  
mçî dirêjî wî dike, Lucky bi pêş ve diçe, ji ber ku  
destên wî tijî ne, ew daqûl dibe, bi diranên xwe  
radihîje qemçî, paşê diçe cihê xwe. Pozzo hewl dide  
ku paltoyê xwe li xwe bike, radiweste.) Palto!  
(Lucky her tiştî datîne erdê, bi pêş ve diçe, alîkariya  
Pozzo dike da ew paltoyê xwe li xwe bike, dizîvire  
cihê xwe, alavên xwe ji erdê dide hev.) Hewa

hênik dibe. (Bişkokên paltoyê xwe digire, daqûl  
 dibe, xwe diedilîne, xwe rast dike) Qemçî!  
 (Lucky bi pêş de diçe, xwe daqûl dike, Pozzo qemçîji  
 dev dikişîne, Lucky diçe cihê xwe.) Hûn dibînin,  
 dostino, ez nikanim demeke dirêj ji hevcinsên  
 xwe bi dûr bimînim (// dû hevcinsên xwe dinihêre)  
 qet nebe hema hebekî jî li min biçûna. (Ji  
 Lucky re.) Kursî! (Lucky bahol û selikê datîne er-  
 25  
 dê, bi pêş de tê, kursiya ku tê vekirin û girtin, vedike,  
 datîne erdê, diçe cihê xwe, bahol û zembîlê ji  
 erdê radike. Pozzo li kursiyê dinihêre.) Nêzîktir!  
 (Lucky bahol û zembîlê datîne erdê, bi pêş ve diçe,  
 cihê kursiyê diguhere, vedigere cihê xwe, radihîje  
 bahol û zembîlê. Pozzo li ser kursiyê rûdine, serê  
 qemçî datîne ser sînga Lucky û wî bi paş de dehf  
 dide.) Bi paş ve! (Lucky bi paş ve diçe.) Wekî din!  
 (Lucky hebekî din jî bi paş ve diçe.) Raweste!  
 (Lucky radiweste. Ji Vladimir û Estragon re.) Ev  
 e, ji bo vê yekê, bi destûra we be, berî ku ez bi pêş  
 de herim, ez dixwazim demekê li ba we bimînim.  
 (Ji Lucky re.) Zembîl! (Lucky bi pêş ve tê, zembîlê  
 didiyê, vedigere cihê xwe.) Hewa vekirî îştahê vedike,  
 zik diqurqurîne. (Zembîlê vedike, hinek mirtşk,  
 perçak nan û şûşeyek şerab derdixe. Ji Lucky  
 re.) Zembîl! (Lucky bi pêş de tê, radihîje zembîlê,  
 diçe cihê xwe, bêtevger radiweste.) Hê jî bi paş de!  
 (Lucky hê jî bi paş de diçe.) Temam! (Lucky radiweste.)

Bêhna genî jê tê. (Şûşe bi ser xwe dadike û demek dirêj vedixwe.) Ji bo saxiya me hemûyan. (Şûşe datîne erdê, dest bi xwarinê dike. Bêdengî.) (Hêdî hêdî cesaret tê Vladimir û Estragon, li dora Lucky dizivirin, wîji serîheta lingan di çav re derbas dikin. Mîna ku wê hinek mirîşka Pozzo ji destên wî birevînin, ew qertan lê dixê, piştî ku hestiyar jê dike û dimêje, divirvirîne, davêje. Lucky li cihê ku lê rawestiyaye, heta ku bahola wî digihîje erdê, ew hêdî hêdî ber bi pêş ve xwe ditewîne, gava bahol digihîje erdê ew li ser xwe disekine, paşê dîsan xwe daqûl dike. Li ser lingan radizê.)

ESRAGON: Çiyê vî heye?

26

dê, bi pêş de tê, kursiya ku tê vekirin û girtin, vedike, datîne erdê, diçe cihê xwe, bahol û zembîlê ji erdê radike. Pozzo li kursiyê dinihêre.) Nêzîktir! (Lucky bahol û zembîlê datîne erdê, bi pêş ve diçe, cihê kursiyê diguhêre, vedigere cihê xwe, radihîje bahol û zembîlê. Pozzo li ser kursiyê rûdine, serê qêmçî datîne ser sînga Lucky û wî bi paş de dehf dide.) Bi paş ve! (Lucky bi paş ve diçe.) Wekî din! (Lucky hebekî din jî bi paş ve diçe.) Raweste! (Lucky radiweste. Ji Vladimir û Estragon re.) Ev e, ji bo vê yekê, bi destûra we be, berî ku ez bi pêş de herim, ez dixwazim demekê li ba we bimînim. (Ji Lucky re.) Zembîl! (Lucky bi pêş ve tê, zembîlê didiyê, vedigere cihê xwe.) Hewa vekirî îştahê vedike,

zik diqurqurîne. (Zembîlê vedike, hinek mirtşk,  
perçak nan û şûşeyek şerab derdixe. Ji Lucky  
re.) Zembîl! (Lucky bi pêş de tê, radihîje zembîlê,  
diçe cihê xwe, bêtevger radiweste.) Hê jî bi paş de!  
(Lucky hê jî bi paş de diçe.) Temam! (Lucky radiweste.)  
Bêhna genî jê tê. (Şûşê bi ser xwe dadike û  
demek dirêj vedixwe.) Ji bo saxiya me hemûyan.  
(Şûşe datîne erdê, dest bi xwarinê dike. Bêdengî.)  
(Hêdî hêdî cesaret tê Vladimir û Estragon, li dora  
Lucky dizivirin, wîji serîheta lingan di çav re derbas  
dikin. Mîna ku wê hinek mirîşka Pozzo ji destên  
wî birevînin, ew qertan lê dixê, piştî ku hestiyar  
jê dike û dimêje, divirvirîne, davêje. Lucky li  
cihê ku lê rawestiyaye, heta ku bahola wî digihîje  
erdê, ew hêdî hêdî ber bi pêş ve xwe ditewîne, gava  
bahol digihîje erdê ew li ser xwe disekine, paşê  
dîsan xwe daqûl dike. Li ser lingan radizê.)

ESRAGON: Çiyê vî heye?

26

VLADIMIR . Westiyayî dixuye.

ESTRAGON: Ew çima alavên di destên xwe de danayne erdê?

VLADIMIR: Ez ê ji ku bizanibim? (Ew hê bêtir nêztkî hev  
dibin.) Dîqet!

ESTRAGON: Ma em bi wî re nepeyivin?

VLADIMIR: Li vir binihêre!

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR (nîşan dide): Stûyê wî.

ESTRAGON (Li stûyê Lucky dinihêre): Ez tiştê nabînim.

VLADIMIR: Were vir.

(Estragon tê cihê Vladimir.)

ESTRAGON: Erê, bi rastî.

VLADIMIR: Birîn bûye?

ESTRAGON: Ji ben bûye.

VLADIMIR: Tê rabûye.

ESTRAGON: Ji xwe tiştê ku wê bibûya ev bû.

VLADIMIR: Girêk lêxistiye.

ESTRAGON: Ji xwe wê bike.

(Ew hûrlênihêrîna xwe ya li ser Lucky didomînin, dawiyê li rûyê wîhûr dinêrin.)

VLADIMIR: Di eslê xwe de ne xerab e.

ESTRAGON (milê xwe dihejîne): Tu wilo dibînî?

VLADIMIR: Hebekî wek jinan.

ESTRAGON: Girêza wî diherike.

VLADIMIR: Ewqasî jî dibe.

ESTRAGON: Kef bi devê wî dikeve.

VLADIMIR: Belkî jî ew yekî aqilsivik e.

ESTRAGON: Yekî ehmeq.

VLADIMIR (serê xwe dirêj dike): Mîna ku guatra wî heye.

ESTRAGON (eynî hereket): Dibe ku jî tunebe.

VLADIMIR: Bêhna wî çikiyaye.

27

VLADIMIR . Westiyayî dixuye.

ESTRAGON: Ew çima alavên di destên xwe de danayne erdê?

VLADIMIR: Ez ê ji ku bizanibim? (Ew hê bêtir nêztkî hev dibin.) Dîqet!

ESTRAGON: Ma em bi wî re nepeyivin?

VLADIMIR: Li vir binihêre!

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR (nîşan dide): Stûyê wî.

ESTRAGON (Li stûyê Lucky dinihêre): Ez tişteki nabînim.

VLADIMIR: Were vir.

(Estragon tê cihê Vladimir.)

ESTRAGON: Erê, bi rastî.

VLADIMIR: Birîn bûye?

ESTRAGON: Ji ben bûye.

VLADIMIR: Tê rabûye.

ESTRAGON: Ji xwe tiştê ku wê bibûya ev bû.

VLADIMIR: Girêk lêxistiye.

ESTRAGON: Ji xwe wê bike.

(Ew hûrlênihêrîna xwe ya li ser Lucky didomînin,  
dawayê li rûyê wîhûr dinêrin.)

VLADIMIR: Di eslê xwe de ne xerab e.

ESTRAGON (milê xwe dihejîne): Tu wilo dibînî?

VLADIMIR: Hebekî wek jinan.

ESTRAGON: Girêza wî diherike.

VLADIMIR: Ewqasî jî dibe.

ESTRAGON: Kef bi devê wî dikeve.

VLADIMIR: Belkî jî ew yekî aqilsivik e.

ESTRAGON: Yekî ehmeq.

VLADIMIR (serê xwe dirêj dike): Mîna ku guatra wî heye.

ESTRAGON (eynî hereket): Dibe ku jî tunebe.

VLADIMIR: Bêhna wî çikiyaye.

27

ESTRAGON: Ewqas jî dibe.

VLADIMIR: Baş e, çavên wî?

ESTRAGON: Çi bi çavên wî hatine?

VLADIMIR: Ji kortikên xwe pengizîne der.

ESTRAGON: Bi min ew li ber mirinê ye.

VLADIMIR: Ne xuya ye. (Demek.) Tişteki ji wî bipirse.

ESTRAGON: Ma di cih de ye?

VLADIMIR: Em ê çi winda bikin?

ESTRAGON (bi vekişîn): Begê min...

VLADIMIR: Bi dengê hê bilindtir.

ESTRAGON (bi dengê hê bilindtir): Begê min...

POZZO: Wî rehet bihêlin! (Ew li Pozzoyê ku xwarina xwe qedandiye û bi piştê destê xwe devê xwe pakij dike, dizivirin. ) Ma tu nabînî ku ew dixwaze guhdarî bike? (Ew qalûna xwe derdixe û tijî dike. Estragon hestiyên mirîşkê li erdê dibîne û çavên xwe bi îştah berdide wan. Pozzo darikekî kibrîtê pê dixê û qalûna xwe pê dixê.) Zembîl! (Lucky ji cihê xwe tevna live, Pozzo kibrîtê bi hêrs divirvirîne, xwe bi ben ve dadiliqîne.) Zembîl! (Lucky dike ku bikeve, xwe dicivîne ser hev, bi pêş de diçe, şû-şê dixê zembîlê, vedigere cihê xwe, dikeve rewşa xwe ya berê. Estragon li hestiyên dinihêre, Pozzo darikekî din pê dixê û hewl dide ku qalûna xwe pê xe. ) Ox, dinya heye.

ESTRAGON (bi tirs): Begê min...

POZZO: Çi ye, heval?

ESTRAGON: Çîk... ger êdî hûn nexwin... ger êdî karê we xelas bûbe... bi van hestiyên... ne wilo, begê min?



VLADIMIR (mîna ku rezîl bûbe); Ma qey tu nikanîbû li benda çûyina wî rawestiya?

POZZO: Ji xwe ew dikane bipirse, ev tişteki pirr xwezayî  
28

ESTRAGON: Ewqas jî dibe.

VLADIMIR: Baş e, çavên wî?

ESTRAGON: Çi bi çavên wî hatine?

VLADIMIR: Ji kortikên xwe pengizîne der.

ESTRAGON: Bi min ew li ber mirinê ye.

VLADIMIR: Ne xuya ye. (Demek.) Tişteki ji wî bipirse.

ESTRAGON: Ma di cih de ye?

VLADIMIR: Em ê çi winda bikin?

ESTRAGON (bi vekişîn): Begê min...

VLADIMIR: Bi dengê hê bilindtir.

ESTRAGON (bi dengê hê bilindtir): Begê min...

POZZO: Wî rehet bihêlin! (Ew li Pozzoyê ku xwarina xwe qedandiye û bi pişta destê xwe devê xwe pakij dike, dizîvirin. ) Ma tu nabînî ku ew dixwaze guhdaî bike? (Ew qalûna xwe derdixe û tijî dike. Estragon hestiyên mirîşkê li erdê dibîne û çavên xwe bi îştah berdide wan. Pozzo darikekî kibrîtê pê dixê û qalûna xwe pê dixê.) Zembîl! (Lucky ji cihê xwe tevnalîve, Pozzo kibrîtê bi hêrs divirvirîne, xwe bi ben ve dadiliqîne.) Zembîl! (Lucky dike ku bikeve, xwe dicivîne ser hev, bi pêş de diçe, şû-şê dixê zembîlê, vedigere cihê xwe, dikeve rewşa xwe ya berê. Estragon li hestiyên dinihêre, Pozzo darikekî din pê dixê û hewl dide ku qalûna xwe

pê xe. ) Ox, dinya heye.

ESTRAGON (bi tirs): Begê min...

POZZO: Çi ye, heval?

ESTRAGON: Çîk... ger êdî hûn nexwin... ger êdî karê we  
xelas bûbe... bi van hestiyan... ne wilo, begê min?

VLADIMIR (mîna ku rezîl bûbe); Ma qey tu nikanîbû li  
benda çûyina wî rawestiya?

POZZO: Ji xwe ew dikane bipirse, ev tişteki pirr xwezayî

28

ye. Ger karê min bi hestiyan qediya be? (Bi serê  
qemçî hestî tev dida.) Erê, karê şexsê min bi xwe  
qediya. (Estragon gavekê ber bi hestiyan ve davê-  
je.) Hestî pêşî yê barkêş e. Di vê rewşê de divê ji  
wî bête pirsîn. (Estragon dizîvire ser Lucky, radiweste.)

Bipirse cano, ji wî bipirse, metirse, ew ê bibêje.

(Estragon ber bi Lucky ve diçe, li ber wî radiweste.

)

ESTRAGON: Mîrza... li min bibûre, Mîrza... (Lucky tu reaksiyonê  
nîşan nade. Pozzo qemçiyê xwe dike şîrqînî,  
Lucky serê xwe bilind dike.)

POZZO: Ji te re tê gotin, beraz. Bersiv bide. (Ji Estragon  
re.) Bipirse.

ESTRAGON: Bibûre, Mîrza, gelo tu hestiyan dixwazî?

(Lucky demeke dirêj li Estragon dinihêre.)

POZZO (dikene.): Ji wî re Mîrza got. (Lucky serê xwe ditewîne.)

Bersiv bide! Tu dixwazî an tu naxwazî? (Ji

Lucky deng dernakeve. Ji Estragon re) Hestî yên

we ne. (Estragon êrîşî hestiyan dike, wan dikoje. )

Çi ecêb e, hestiyê ku ez pêşî didimê bi paş de vedigerîne.

(Lucky bi xemgînî dinihêre.) Ez hêvîdar

im ew mîna nexweşiyekê filan, henekeke kerane

nake. (Qalûna xwe pê dixê.)

VLADIMIR (bi hêrs.): Şerm e yaho, şerm e!

(Bêdengî. Estragon bi heyret dev ji kotina hestiyên

berdide, carekê li Vladimir, carekê li Pozzo dinihê-

re. Pozzo gelekîsakîn e; Vladimir jî her ku diçe hê

bêhuzûrtir dibe.)

POZZO (Ji Vladimir re.): Ma tu dixwazî tiştêkî bibêjî?

VLADIMIR (Bi biryar e, lêbelê zehmetiya gotinê dikişîne.)

Li hember mirovekî (Luckuy nîşan dide) wilo

tevgerîn... bi min ev... ji mirovekî re... çênabe... ev

29

ye. Ger karê min bi hestiyên qediya be? (Bi serê

qemçî hestî tev dida.) Erê, karê şexsê min bi xwe

qediya. (Estragon gavekê ber bi hestiyên ve davê-

je.) Hestî pêşî yê barkêş e. Di vê rewşê de divê ji

wî bête pirsîn. (Estragon dizîvire ser Lucky, radiweste.)

Bipirse cano, ji wî bipirse, metirse, ew ê bibêje.

(Estragon ber bi Lucky ve diçe, li ber wî radiweste.

)

ESTRAGON: Mîrza... li min bibûre, Mîrza... (Lucky tu reaksiyonê

nîşan nade. Pozzo qemçiyê xwe dike şîrqînî,

Lucky serê xwe bilind dike.)

POZZO: Ji te re tê gotin, beraz. Bersiv bide. (Ji Estragon

re.) Bipirse.

ESTRAGON: Bibûre, Mîrza, gelo tu hestiyên dixwazî?

(Lucky demeke dirêj li Estragon dinihêre.)

POZZO (dikene.): Ji wî re Mîrza got. (Lucky serê xwe ditewîne.)

Bersiv bide! Tu dixwazî an tu naxwazî? (Ji

Lucky deng dernakeve. Ji Estragon re) Hestî yên

we ne. (Estragon êrîşî hestiyên dike, wan dikoje. )

Çi ecêb e, hestiyê ku ez pêşî didimê bi paş de vedigerîne.

(Lucky bi xemgînî dinihêre.) Ez hêvîdar

im ew mîna nexweşiyekê filan, henekeke kerane

nake. (Qalûna xwe pê dixê.)

VLADIMIR (bi hêrs.): Şerm e yaho, şerm e!

(Bêdengî. Estragon bi heyret dev ji kotina hestiyên

berdide, carekê li Vladimir, carekê li Pozzo dinihê-

re. Pozzo gelekîsakîn e; Vladimir jî her ku diçe hê

bêhuzûrtir dibe.)

POZZO (Ji Vladimir re.): Ma tu dixwazî tiştêkî bibêjî?

VLADIMIR (Bi biryar e, lêbelê zehmetiya gotinê dikişîne.)

Li hember mirovekî (Luckuy nîşan dide) wilo

tevgerîn... bi min ev... ji mirovekî re... çênabe... ev

29

şerm e yaho, şerm e!

ESTRAGON (Naxwaze jê bimîne): Ji vê re rezalet tê gotin!

(Gotina xwe didomîne.)

POZZO: Ez dinêrim tu pirr hişk î. (Ji Vladimir re) Pirs ne

eyb be tu çend salî yî? (Bêdengî.) Şêst?... Heftê?...

(Ji Estragon re) Ew dikane çend salî be?

ESTRAGON: Ji wî bipirse.

POZZO: Tiştê ku ne karê min be ez pozê xwe: diximê. (Qalûna

xwe li qemçiyê xwe dixê û vala dike, radibe

ser lingan.) Ez ê ji we veqetim. Ji bo ku hûn bi min re ne ez we spas dikim. (Difikire.) Gelo ez qalûneke din jî bikînim? Ha, tu çi dibêjî? (Ew tişteki nabêjin.) Na, ez ne wilo tiryakî filan im, ez ji kêfî dikişînim; Min di jiyana xwe du qalûn li dû hev nekişandiyê. (Destê xwe datîne ser dilê xwe) lê dixê. (Demek.) Nîkotînê çêdike, ez çiqas dîqet bikim jî, dîsan ez dikişînim nava xwe. (Hesreteke kûr dikişîne) Tii ê çi bikî. (Bêdengî.) Belkî hûn ne tiryakî ne. Ne wilo? Guh mediyê, em zêde lê hûr nebin. (Bêdengî. ) Baş e, niha gava ez carekê rabim ser xwe, ez ê bi awayekî xwezayî çawan dîsan li cihê xwe rûnê? Yanî, çilo, bê ku mirov hewa tewandinê bidiyê. (Ji Vladimir re) Ezbenî? (Bêdengî.) Ma te tişteki negot? (Bêdengî.) Ne muhîm e. Çik... (Difikire.)

ESTRAGON: Oxx! Ez bi ser xwe ve hatim. (Ew hestiyar divirvirîne, davêje.)

VLADIMIR: Em herin.

ESTRAGON: A niha?

POZZO: Deqekê! (Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Kursî! (Bi qemçiyê xwe kursiyê xwe nîşan dide. Lucky cihê kursiyê diguhere.) Hebekî din jî! Li vir! (Rûdinê.

30

şerm e yaho, şerm e!

ESTRAGON (Naxwaze jê bimîne): Ji vê re rezalet tê gotin! (Gotina xwe didomîne.)

POZZO: Ez dinêrim tu pirr hişk î. (Ji Vladimir re) Pirs ne

eyb be tu çend salî yî? (Bêdengî.) Şêst?... Heftê?...

(Ji Estragon re) Ew dikane çend salî be?

ESTRAGON: Ji wî bipirse.

POZZO: Tiştê ku ne karê min be ez pozê xwe: diximê. (Qalûna

xwe li qemçiyê xwe dixê û vala dike, radibe

ser lingan.) Ez ê ji we veqetim. Ji bo ku hûn bi

min re ne ez we spas dikim. (Difikire.) Gelo ez qalûneke

din jî bikînim? Ha, tu çî dibêjî? (Ew tişteki

nabêjin.) Na, ez ne wilo tiryakî filan im, ez ji

kêfî dikişînim; Min di jiyana xwe du qalûn li dû

hev nekişandiye. (Destê xwe datîne ser dilê xwe)

lê dixê. (Demek.) Nîkotînê çêdike, ez çiqas dîqet

bikim jî, dîsan ez dikişînim nava xwe. (Hesreteke

kûr dikişîne) Tii ê çî bikî. (Bêdengî.) Belkî hûn ne

tiryakî ne. Ne wilo? Guh mediyê, em zêde lê hûr

nebin. (Bêdengî. ) Baş e, niha gava ez carekê rabim

ser xwe, ez ê bi awayekî xwezayî çawan dîsan li

cihê xwe rûnê? Yanî, çilo, bê ku mirov hewa tewandinê

bidiyê. (Ji Vladimir re) Ezbenî? (Bêdengî.)

Ma te tişteki negot? (Bêdengî.) Ne muhîm e.

Çîk... (Difikire.)

ESTRAGON: Oxx! Ez bi ser xwe ve hatim. (Ew hestiyar

divirvirîne, davêje.)

VLADIMIR: Em herin.

ESTRAGON: A niha?

POZZO: Deqekê! (Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Kursî! (Bi qemçiyê

xwe kursiyê xwe nîşan dide. Lucky cihê

kursiyê diguhere.) Hebekî din jî! Li vir! (Rûdinê.

30

Lucky dihere cihê xwe, radihêje bahol û selikê.)

Ev e, ez ji nû ve li ser kursiya xwe rûniştim! (Qalûna xwe dadigire.)

VLADIMIR: Em herin.

POZZO: Ez hêvîdar im ez we naqewirînim. Hebekî din jî bimînin, hûn poşman nabin.

ESTRAGON (dîsan ew hesab dike ku ew ê tiştêkî bi dest bixîne): wexta me pirr e.

POZZO (piştî ku qalûna xwe pê dixê): A duwemîn tu wextê (qalûna xwe dixê destê xwe û lê dinihêre) nabe weke a yekemîn, ev wilo ye. (Qalûna xwe dixê devê xwe.) Lê dîsan jî ne xerab e.

VLADIMIR: Ez diçim.

POZZO: Ew nikane hebûna min qebûl bike. Bê şik ez ne tam mirov im, lê ji we re çî? (Ji Vladimir re) Bê ku hûn tiştêkî bikin, divê hûn bifikirin. Em bibêjin hûn niha têkevin rê, hê ku dinya rohnê ye, ji ber ku dinya rohnê ye. (Hersê jî li esmên dinêrin.) Baş e. Wê di vê rewşê de çî bibe: (qalûna xwe ji devê xwe derdixê, li qalûna xwe dinihêre): vemirî ye: (ew cardin qalûna xwe pê dixê): di vê rewşê de... di vê rewşê de... wê di vê rewşê de çî bibe... hevdudîtina we ev e... çî bû... Godet... Godot... Godin... û (bêdengî) kî be, hûn fêhm dikin ku ez behsa kê dikim, kesê ku pêşeroja we pê ve girêdayî ye (bêdengî) ... yanî pêşeroja we ya nêzîk.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Hûn çawan bi vê dizanin?

POZZO: De kerem bike, ew dîsan bi min re dipeyive! Ger wilo here dawî dawî em ê ji hev hez bikin.

ESTRAGON: Çima ew alavên di destê xwe de danayne erdê?

31

Lucky dihere cihê xwe, radihîje bahol û selikê.)

Ev e, ez ji nû ve li ser kursiya xwe rûniştim! (Qalûna xwe dadigire.)

VLADIMIR: Em herin.

POZZO: Ez hêvîdar im ez we naqewirînim. Hebekî din jî bimînin, hûn poşman nabin.

ESTRAGON (dîsan ew hesab dike ku ew ê tiştêkî bi dest bixîne): wexta me pirr e.

POZZO (piştî ku qalûna xwe pê dixê): A duwemîn tu wextê (qalûna xwe dixê destê xwe û lê dinihêre) nabe weke a yekemîn, ev wilo ye. (Qalûna xwe dixê devê xwe.) Lê dîsan jî ne xerab e.

VLADIMIR: Ez diçim.

POZZO: Ew nikane hebûna min qebûl bike. Bê şik ez ne tam mirov im, lê ji we re çî? (Ji Vladimir re) Bê ku hûn tiştêkî bikin, divê hûn bifikirin. Em bibêjin hûn niha têkevin rê, hê ku dinya rohnî ye, ji ber ku dinya rohnî ye. (Hersê jî li esmên dinêrin.) Baş e. Wê di vê rewşê de çî bibe: (qalûna xwe ji devê xwe derdixê, li qalûna xwe dinihêre): vemirî ye: (ew cardin qalûna xwe pê dixê): di vê rewşê de... di vê rewşê de... wê di vê rewşê de çî bibe... hevdudîtina we ev e... çî bû... Godet... Godot... Godin...



û (bêdengî) kî be, hûn fêhm dikin ku ez behsa  
kê dikim, kesê ku pêşeroja we pê ve girêdayî ye  
(bêdengî) ... yanî pêşeroja we ya nêzîk.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Hûn çawan bi vê dizanin?

POZZO: De kerem bike, ew dîsan bi min re dipeyive! Ger  
wilo here dawî dawî em ê ji hev hez bikin.

ESTRAGON: Çima ew alavên di destê xwe de danayne erdê?

31

POZZO: Ez bi pêrgîhatina we dilşa dibûm. Ez çiqas bi pirr  
mirovan re hevdu bibînim, ez ewçend dilşa dibim.

Mirov ji yê herî neqenc jî hînî tiştinan dibe, mirov  
dewlemend dibe, baştir digihîje tama dilşahiyê.

Hûn jî (bi hêviya ew fêhm bikin, ku ew ji  
wan re dibêje, hem li vî, hem jî li yê din dinihêre)  
belkî we tişteke daye min.

ESTRAGON: Çima ew alavên di destê xwe de danayne erdê?

POZZO: Tiştê mirov ne li bendî ye, dibe.

VLADIMIR: Ji we tişteke tete pirsîn.

POZZO (pirr kêfxweş.) Ma pirsê? Kî? Çi pirs? (Bêdengî.)

Te berî niha bi lerizîn ji min re Mîrza digot. Tu niha  
jî ji min pirsan dipirsî. Dawiya vê yekê xerab e.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ez texmîn dikim li te guhdarî  
dike.

ESTRAGON (Wîdîsan dest pê kiriye û li dora Lucky diçe û  
tê.): Çi?

VLADIMIR: Tu niha dikanî ji wî bipirsî. Wî niyeta te fêhm  
kiriye.

ESTRAGON: Ez ji wî çi bipirsim?

VLADIMIR: Bê ji bo çi ew alavên di destên xwe de danayne erdê?

ESTRAGON: Ez jî fêhm nakim ku.

VLADIMIR: Ji wî bipirse.

POZZO (Ew li gotûbêja Estragon û Vladimir bi xemgîniyeke bi dîqet temaşe dike, naxwaze dawî bi erdê ve here.) Yanî, mîna ku hûn dibêjin, hûn dixwazin ji min bipirsin bê ew çima alavên di destên xwe de danayne erdê, ne wilo?

VLADIMIR: Eynîwilo.

POZZO (Ji Estragon re): Hûn jî tesdîq dikin?

32

POZZO: Ez bi pêrgîhatina we dilşa dibûm. Ez çiqas bi pirr mirovan re hevdu bibînîm, ez ewçend dilşa dibim.

Mirov ji yê herî neqenc jî hînî tiştinan dibe, mirov dewlemend dibe, baştir digihîje tama dilşahiyê.

Hûn jî (bi hêviya ew fêhm bikin, ku ew ji wan re dibêje, hem li vî, hem jî li yê din dinihêre) belkî we tişteke daye min.

ESTRAGON: Çima ew alavên di destê xwe de danayne erdê?

POZZO: Tiştê mirov ne li bendî ye, dibe.

VLADIMIR: Ji we tişteke tete pirsîn.

POZZO (pirr kêfxweş.) Ma pirsê? Kî? Çi pirs? (Bêdengî.)

Te berî niha bi lerizîn ji min re Mîrza digot. Tu niha jî ji min pirsan dipirsî. Dawiya vê yekê xerab e.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ez texmîn dikim li te guhdarî dike.

ESTRAGON (Wîdîsan dest pê kiriye û li dora Lucky diçe û têt.): Çi?

VLADIMIR: Tu niha dikanî ji wî bipirsî. Wî niyeta te fêhm kiriye.

ESTRAGON: Ez ji wî çi bipirsim?

VLADIMIR: Bê ji bo çi ew alavên di destên xwe de danayne erdê?

ESTRAGON: Ez jî fêhm nakim ku.

VLADIMIR: Ji wî bipirse.

POZZO (Ew li gotûbêja Estragon û Vladimir bi xemgîniyeke bi dîqet temaşe dike, naxwaze dawî bi erdê ve here.) Yanî, mîna ku hûn dibêjin, hûn dixwazin ji min bipirsin bê ew çima alavên di destên xwe de danayne erdê, ne wilo?

VLADIMIR: Eynîwilo.

POZZO (Ji Estragon re): Hûn jî tesdîq dikin?

32

ESTRAGON (Zîvirandina xwe ya li dor Lucky didomîne): Mîna fokekî dike helke helk.

POZZO: Ez ê bersiva we bidim. (Ji Estragon re) Ji kerema xwe re hebekî sakîn bin, hûn min jî hêrs dikin.

VLADIMIR: Were vir.

ESTRAGON: Çi ye?

VLADIMIR: Wê bipeyive.

POZZO: Pir baş e. Her kes li vir in? Her kes li min dinêrin? (Li Lucky dinihêre, xwe bi ben ve dadiliqîne.

Lucky serê xwe bilind dike.) Li min binêre, beraz!

(Lucky li wî dinihêre.) Mukemel e. (Ew qalûna

xwe dixe bêrîka xwe, ji bêrtka xwe ji bo ku nefesê veke aletekî pijiqandinê derdixe, dipijiqîne qirika xwe, dîsan alet dixe bêrîka xwe, qirika xwe pak dike, tif dike, dîsan alet derdixc, dipijiqîne qirika xwe, dixe bêrîka xwe.) Ez amade me. Her kes li min guhdarî dîkin? (Li Lucky dinihêre. Xwe bi ben ve dadiliqîne.) Bimeşe! (Lucky dimeşe.) Temam! (Lucky radiweste.) Her kes amade ye? (Li hersiyan dinihêre, dawiyê jî li Lucky dinihêre. Xwe bi ben ve dadiliqîtie.) Çi ye? (Lucky serê xwe bilind dike.) Ez ji peyva bê sedem hez nakim. Baş e. Niha. (Difikire.)

ESTRAGON: Ez diçim.

POZZO: We tam ji min çî pirsî bû?

VLADIMIR: Tiştên di destên te de...

POZZO (Bi hêrs): Peyva min nebirin! (Demek. Hê sakîntir) Ger em hemû bi hev re dest bi peyvê bikin dawiya wê nayê. (Demek.) Min çî digot? (Demek. Bi dengekî hê bilindtir) Min çî digot? (Vladimir zarîyekîku barekîgiran hilgirtiye dike. Pozzo bêî ku tiştetekîjê fêhm bike lê dinihêre.)

33

ESTRAGON (Zîvirandina xwe ya li dor Lucky didomîne): Mîna fokekî dike helke helk.

POZZO: Ez ê bersiva we bidim. (Ji Estragon re) Ji kerema xwe re hebekî sakîn bin, hûn min jî hêrs dîkin.

VLADIMIR: Were vir.

ESTRAGON: Çi ye?

VLADIMIR: Wê bipeyive.

POZZO: Pir baş e. Her kes li vir in? Her kes li min dinêrin?

(Li Lucky dinihêre, xwe bi ben ve dadiliqîne.

Lucky serê xwe bilind dike.) Li min binêre, beraz!

(Lucky li wî dinihêre.) Mukemel e. (Ew qalûna xwe dixê bêrîka xwe, ji bêrtka xwe ji bo ku nefesê

veke aletekî pijiqandinê derdixê, dipijiqîne qirika

xwe, dîsan alet dixê bêrîka xwe, qirika xwe pak

dike, tif dike, dîsan alet derdixê, dipijiqîne qirika

xwe, dixê bêrîka xwe.) Ez amade me. Her kes li

min guhdarî dikin? (Li Lucky dinihêre. Xwe bi

ben ve dadiliqîne.) Bimeşe! (Lucky dimeşe.) Temam!

(Lucky radiweste.) Her kes amade ye? (Li

hersiyar dinihêre, dawiyê jî li Lucky dinihêre.

Xwe bi ben ve dadiliqîtie.) Çi ye? (Lucky serê xwe

bilind dike.) Ez ji peyva bê sedem hez nakim. Baş

e. Niha. (Difikire.)

ESTRAGON: Ez diçim.

POZZO: We tam ji min çî pirsî bû?

VLADIMIR: Tiştên di destên te de...

POZZO (Bi hêrs): Peyva min nebirin! (Demek. Hê sakîntir)

Ger em hemû bi hev re dest bi peyvê bikin dawiya

wê nayê. (Demek.) Min çî digot? (Demek. Bi dengekî

hê bilindtir) Min çî digot? (Vladimir zarîyekîku

barekîgiran hilgirtiye dike. Pozzo bêî ku tiş-

tekîjê fêhm bike lê dinihêre.)

33

ESTRAGON (bi dengekî bi hêz): Firax! (Bi tiliya xwe

Lucky nîşan dide.) Çima? Her girtin! (Di binê bar de, piştta wî tewiyaye û bêhna xwe digire û berdide, dileyize.) Hîç berdan. (Destên xwe vedikin û mîna ku rehet bûbe radibe.) Çima?

POZZO: Temam. Diviyabû ev yeka ha berê ji min re bigota. Ew çima li rehetiya xwe nanihêre. Em hewl bidin vê rohnê bikin. Ma heqê wî û vê tune ye? Heye. Ma gelo ev tê mana ku ew naxwaze? (Demek.) Ezbenî, ez ê vê ji we re bibêjim.

VLADIMIR: Dîqet!

POZZO: Ji bo ku ew li ba min bimîne, ew dixwaze tesîrê li min bike.

ESTRAGON: Çawa?

POZZO: Ez bawer im min tam bi we neda fêhmkirin. Ji bo pêşiyê li jihevveqetandina me bigire, ew dilê min bi xwe dişewitîne. Na, tam ne wilo ye.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji ba xwe biqewirînî?

POZZO: Ew dixwaze min bikuje, lê ew nikane.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji ba xwe biqewirînî?

POZZO: Ger ez bibînim ew barkêşekî baş e, ew texmîn dike ku ez ê di pêş de jî bixwazibim wî di vî karî de bi kar bînim.

VLADIMIR: Ma tu êdî wî naxwazî?

POZZO: Bi rastî jî ew mîna berazekî hildigire. Ev e mijûliya wî, ne ev. VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewirînî?

POZZO: Ew texmîn dike ku ez bibînim ku ew naweste, ez ê ji biryara xwe bigerim. Hesabê wî yê kirêt ev e. Tu dibê qey barkêşekî din li ber destên min tune ye!

(Hersê jî li Lucky dinihêrin.) Atlas, lawê Jupîter!  
(Bêdengt.) Ev e. Ez bawer im min pirsar we bersi-  
34

ESTRAGON (bi dengê bi hêz): Firax! (Bi tiliya xwe  
Lucky nîşan dide.) Çima? Her girtin! (Di binê bar  
de, piştî wî tewiyaye û bêhna xwe digire û berdide,  
dileyize.) Hîç berdan. (Destên xwe vedikin û  
mîna ku rehet bûbe radibe.) Çima?

POZZO: Temam. Diviyabû ev yeka ha berê ji min re bigota.  
Ew çima li rehetiya xwe nanihêre. Em hewl bidin  
vê rohnê bikin. Ma heqê wî û vê tune ye? Heye.  
Ma gelo ev tê mana ku ew naxwaze? (Demek.)  
Ezbenî, ez ê vê ji we re bibêjim.

VLADIMIR: Dîqet!

POZZO: Ji bo ku ew li ba min bimîne, ew dixwaze tesîrê li  
min bike.

ESTRAGON: Çawa?

POZZO: Ez bawer im min tam bi we neda fêhmkirin. Ji bo  
pêşiyê li jihevveqetandina me bigire, ew dilê min  
bi xwe dişewitîne. Na, tam ne wilo ye.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji ba xwe biqewirînî?

POZZO: Ew dixwaze min bikuje, lê ew nikane.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji ba xwe biqewirînî?

POZZO: Ger ez bibînim ew barkêşekê baş e, ew texmîn dike  
ku ez ê di pêş de jî bixwazibim wî di vî karî de  
bi kar bînim.

VLADIMIR: Ma tu êdî wî naxwazî?

POZZO: Bi rastî jî ew mîna berazekê hildigire. Ev e mijûliya

wî, ne ev. VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Ew texmîn dike ku ez bibînim ku ew naweste, ez ê ji biryara xwe bigerim. Hesabê wî yê kirêt ev e. Tu dibê qey barkêşekî din li ber destên min tune ye! (Hersê jî li Lucky dinihêrin.) Atlas, lawê Jupîter! (Bêdengt.) Ev e. Ez bawer im min pirsra we bersi-  
34

vand. Tu pirsên we yên din hene? (Bi aleta pijiqandinê qirika xwe pak dike.)

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Ez dixwazim we haydar bikim, ku di şûna wî de ez, di şûna min de jî ew bûya. Ger tesaduf ji vê yekê re nebûya asteng. Her kes digihîje tiştê ku layiqî wê ye.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Libê?

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Erê. Lê digel ku ez bi hêsanî dikanim wî bi kulm û pehînan biqewitînim, ji ber ku damarên min yên qencyê rabûne, ez ê wî ji bo xwendinê bibim mazata Xelaskerê: Ezîz. Yanî ku ez çend quruşan biavêjim bêrîka xwe ma wê xerab be. Ya rastî qewitandina benderuhên di vî celebî de jî ne hêsan e.

Ya herî pak ew e, ku mirov wan pak bike.

(Lucky digirî.)

ESTRAGON: Ew digirî.

POZZO: Çi hebe dîsan di erdê kevin de heye. (Ew destmala xwe dide Estragon.) Mîna ku dilê we bi wî şewitî,



xweşkirina dilê wî jî li we dikeve. (Estragon dudilî dibe.) Bigire. (Estragon destmalê digire.) Çavên xwe pak bike. Tu ê xwe devjêneberdayî hîs bikî. (Estragon her dudilîdibe.)

VLADIMIR: Bide min, ez pak bikim. (Estragon naxwaze ku destmalê bidiyê. Tevgera LAWIKan.)

POZZO: Bilezînin. Ewê niha giriyê xwe bibire. (Estragon nêzîkî Lucky dibe, mîtta ku çavên wî pakij dike radiweste, Lucky bi carekê ve pehîneke pihêt li çî- ma Estragon dixê. Estragon, ji destên xwe berdide, xwe bi paş ve davêje, dikule û bi barîn li dora

35

vand. Tu pirsên we yê din hene? (Bi aleta pijiqandinê qirika xwe pak dike.)

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Ez dixwazim we haydar bikim, ku di şûna wî de ez, di şûna min de jî ew bûya. Ger tesaduf ji vê yekê re nebûya asteng. Her kes digihîje tiştê ku layiqî wê ye.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Libê?

VLADIMIR: Ma tu dixwazî wî ji serê xwe biqewitînî?

POZZO: Erê. Lê digel ku ez bi hêsanî dikanim wî bi kulm û pehînan biqewitînim, ji ber ku damarên min yê qencyê rabûne, ez ê wî ji bo xwendinê bibim mazata Xelaskerê: Ezîz. Yanî ku ez çend quruşan biavêjim bêrîka xwe ma wê xerab be. Ya rastî qewitandina benderuhên di vî celebî de jî ne hêsan e.

Ya herî pak ew e, ku mirov wan pak bike.

(Lucky digirî.)

ESTRAGON: Ew digirî.

POZZO: Çi hebe dîsan di erdê kevin de heye. (Ew destmala xwe dide Estragon.) Mîna ku dilê we bi wî şewitî, xweşkirina dilê wî jî li we dikeve. (Estragon dudilî dibe.) Bigire. (Estragon destmalê digire.) Çavên xwe pak bike. Tu ê xwe devjêneberdayî hîs bikî. (Estragon her dudilîdibe.)

VLADIMIR: Bide min, ez pak bikim. (Estragon naxwaze ku destmalê bidiyê. Tevgera LAWIKan.)

POZZO: Bilezînin. Ewê niha giriyê xwe bibire. (Estragon nêzîkî Lucky dibe, mîtta ku çavên wî pakij dike radiweste, Lucky bi carekê ve pehîneke pihêt li çîma Estragon dixê. Estragon, ji destên xwe berdide, xwe bi paş ve davêje, dikule û bi barîn li dora  
35

sehnê diçe û tê.) Destmal. (Bahol û selikê datîne erdê, destmalê ji erdê radike, bi pêş ve diçe, dide Pozzo, diçe cihê xwe, radihîje bahol û selikê.)

ESTRAGON: Gûyê pîs! ker! (Pantorê xwe rast dike.) çîma min perçe kir.

POZZO: Min ji we re gotibû ku ew ji biyaniyan hez nake.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ka nîşanî min bide. (Estragon çîma xwe nîşanî wî dide. Bi hêrs ji Pozzo re)

Xwîn jê tê!

POZZO: Nîşana qencyê ye.

ESTRAGON (çîmê ku pehîn xwariye li hewa ye) Ez ê careke

din nikanibim bimeşim!

VLADIMIR (bi dilovant): Ez ê te hilgirim. (Demek) Ger pê-wîst be.

POZZO: Ew êdî nagirî. (Ji Estragon re) We li cihekî şûna wî girt. (Xayiz dibe) Li ser rûyê dinyayê hemû hêsirên çavan eynî ne. Gava yek li cihekî dest bi girî dike, li cihekî din hêsirên çavên yekî din radiwestin. Ken jî wilo ye. (Ew diketie.) Wê çaxê divê em dev navêjin dema xwe, ew jî ji yên berê ne xemgîntir e. (Bêdengî.) Em dernexin asmana jî. (Bêdengî.) Em qet behs nekin. (Bêdengî.) Rastiyeke ku nifûsê zêde kiriye.

VLADIMIR: Dixwaze bimeşe.

(Estragon dikule, li ber Lucky radiweste, tif dike Lucky, paşê gava perde vedibe diçe li cihê ku lê rûniştibû, rûdine.)

POZZO: Kê ez hînî van hemû tiştên xweş kirime, hûn dizanin? (Demekê mîna ku tiliya xwe bi Lucky bike, ber bi wî ve dirêj dike) Ew!

VLADIMIR (Li asman dinihêre): Ma wê îro qet nebe şev?

POZZO: Ger ew tunebûya, min tu carî tiştên bêkêr yên bi 36

sehnê diçe û tê.) Destmal. (Bahol û selikê datîne erdê, destmalê ji erdê radike, bi pêş ve diçe, dide Pozzo, diçe cihê xwe, radihîje bahol û selikê.)

ESTRAGON: Gûyê pîs! ker! (Pantorê xwe rast dike.) çîma min perçe kir.

POZZO: Min ji we re gotibû ku ew ji biyaniyan hez nake.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ka nîşanî min bide. (Estragon çîma xwe nîşanî wî dide. Bi hêrs ji Pozzo re)  
Xwîn jê tê!

POZZO: Nîşana qencyê ye.

ESTRAGON (çîmê ku pehîn xwariye li hewa ye) Ez ê careke din nikanibim bimeşim!

VLADIMIR (bi dilovant): Ez ê te hilgirim. (Demek) Ger pê-wîst be.

POZZO: Ew êdî nagirî. (Ji Estragon re) We li cihekî şûna wî girt. (Xayiz dibe) Li ser rûyê dinyayê hemû hêsirên çavan eynî ne. Gava yek li cihekî dest bi girî dike, li cihekî din hêsirên çavên yekî din radiwestin. Ken jî wilo ye. (Ew diketie.) Wê çaxê divê em dev navêjin dema xwe, ew jî ji yên berê ne xemgîntir e. (Bêdengî.) Em dernexin asmana jî. (Bêdengî.) Em qet behs nekin. (Bêdengî.) Rastiyeke ku nifûsê zêde kiriye.

VLADIMIR: Dixwaze bimeşe.

(Estragon dikule, li ber Lucky radiweste, tif dike Lucky, paşê gava perde vedibe diçe li cihê ku lê rûniştibû, rûdine.)

POZZO: Kê ez hînî van hemû tiştên xweş kirime, hûn dizanin? (Demekê mîna ku tiliya xwe bi Lucky bike, ber bi wî ve dirêj dike) Ew!

VLADIMIR (Li asman dinihêre): Ma wê îro qet nebe şev?

POZZO: Ger ew tunebûya, min tu carî tiştên bêkêr yên bi

36  
mijûliya min ve: mijûliya min we eleqeder nake:

girêdayî nedifikirîm. Spehîti, nazdarî, rastiya pak,  
di ber min re jî nebuhurî bûn.

VLADIMIR (bê ku di destê wî de be asmana dispêre pirsyariyê):

Te got di ber te nebuhurî bû?

POZZO: Di nêzîk de dibe şêst sal ku min dest pê kiriye...

(di ber xwe de dihejmêre)... erê, di nêzîk de dibe

şêst sal. (Gurûrê di xwe de dibîne û radibe ser

xwe.) Ez ewqasî nîşan nadim, ne wilo? (Ew li Vladimir

û Estragon dinihêre.) Şewqe! (Lucky selikê

datîne erdê, şewqeyê wî derdixe. Porê spî û tov bi

ser rûyê wî de daketibû. Şewqeyê xwe dixê bin

çengê xwe, selikê ji erdê radike.) Niha binêrin.

(Pozzo şewqeyê xwe derdixe . Por ji bin ve bi serê

wî ve tune. Şewqeyê xwe dide serê xwe) We dît?

VLADIMIR: Ma hûn ê niha wî biqewirînin? Xizmetkarekî

evqas kal û evqas sadiq?

ETRAGON: Gûyê pîs!

(Pozzo her ku diçe bêtir bi heyecan dibe.)

VLADIMIR: Piştî ku hûn xwîna wî dimêjin, hûn wî eynî...(//

gotinê digere)..eym mîna qaşilê mûzekê diavêjin.

Mukur werin ku...

POZZO (dinale û serê xwe dixê nava kefên destên xwe): Ez

êdî debar nakim... ez debar nakim... kirinên te...

tu nizanî... tirsehêz... divê em herin... (Milê xwe li

ba dike) ... ez aqilê xwe wînda dikim... (Serê wî di

nava milê wî de, lodî erdê dibe.) Ez êdî debar nakim,

debar nakim... (Bêdengî. Hemû li Pozzo dinihêrin.

Lucky gêj dibe.)

VLADIMIR: Ew êdî debar nake.

ESTRAGON: Tişteki ecêb e.

VLADIMIR: Ew aqilê xwe winda dike.

37

mijûliya min ve: mijûliya min we eleqeder nake:  
girêdayî nedifikirîm. Spehîti, nazdarî, rastiya pak,  
di ber min re jî nebuhurî bûn.

VLADIMIR (bê ku di destê wî de be asmana dispêre pirsyariyê):  
Te got di ber te nebuhurî bû?

POZZO: Di nêzîk de dibe şêst sal ku min dest pê kiriye...

(di ber xwe de dihejmêre)... erê, di nêzîk de dibe  
şêst sal. (Gurûrê di xwe de dibîne û radibe ser  
xwe.) Ez ewqasî nîşan nadim, ne wilo? (Ew li Vladimir  
û Estragon dinihêre.) Şewqe! (Lucky selikê  
datîne erdê, şewqeyê wî derdixe. Porê spî û tov bi  
ser rûyê wî de daketibû. Şewqeyê xwe dixê bin  
çengê xwe, selikê ji erdê radike.) Niha binêrin.  
(Pozzo şewqeyê xwe derdixe . Por ji bin ve bi serê  
wî ve tune. Şewqeyê xwe dide serê xwe) We dît?

VLADIMIR: Ma hûn ê niha wî biqewirînin? Xizmetkarekî  
evqas kal û evqas sadiq?

ESTRAGON: Gûyê pîs!

(Pozzo her ku diçe bêtir bi heyecan dibe.)

VLADIMIR: Piştî ku hûn xwîna wî dimêjin, hûn wî eynî...(//  
gotinê digere)..eym mîna qaşilê mûzekê diavêjin.

Mukur werin ku...

POZZO (dinale û serê xwe dixê nava kefên destên xwe): Ez  
êdî debar nakim... ez debar nakim... kirinên te...

tu nizanî... tirsehêz... divê em herin... (Milê xwe li ba dike) ... ez aqilê xwe winda dikim... (Serê wî di nava milê wî de, lodî erdê dibe.) Ez êdî debar nakim, debar nakim... (Bêdengî. Hemû li Pozzo dinihêrin. Lucky gêj dibe.)

VLADIMIR: Ew êdî debar nake.

ESTRAGON: Tişteki ecêb e.

VLADIMIR: Ew aqilê xwe winda dike.

37

ESTRAGON: Tişteki xerab e.

VLADIMIR (Ji Lucky re): Hûn çawan vê yekê bi wî dikin? Gelekî şerm e! Bi mirovekî wilo! Ezabekî weha bide kişandin! Piştî evqas sal! Ev ne tişteki kirinê ye!

POZZO (Bi îskîn): Berê... bi nazikî...alîkariya min dikir... kêfa min tanî... hukum dida min... lê niha... min mehû dike...

ESTRAGON (Ji Vladimir re): Ma ew dixwaze di şûna wî de yekî din bigire?

VLADIMIR: Çawa?

ESTRAGON: Ew dixwaze di şûna wî de yekî din bigire, an jî ew ji wî pê ve yekî din naxwaze, min tam fêhm nekir.

VLADIMIR: Ez guman nakim.

ESTRAGON: Çawa?

VLADIMIR: Ez nizanim . ESTRAGON: Divê mirov ji wî bipirse.

POZZO (Ew haş bû ye): Hevalno, ez nizanim çi bi min hat.

Ez uzra xwe ji we dixwazim. Wan ji bîr bikin.

(Her ku diçe ew hê bêtir dibe hakimê xwe.) Ez tam nizanim bê min çi gotine, lê hûn emîn bin ku yek ji gotinên ku ez dibêjim jî ne rast bûn. (Ew radibe ser xwe, kulman îî sînga xwe dixwe.) Ma ez dişibim yekî ku êşê dide kişandin, ha! De here ji wir! (Bêrîkên xwe tev dide.) Min qalûna xwe xiste ku?

VLADIMIR: Şeveke pir xweş e.

ESTRAGON: Nayê jibîrkirin.

VLADIMIR : Hê jî xelas nebûye.

ESTRAGON: Wilo dixuye.

VLADIMIR: Hê nû dest pê dike.

38

ESTRAGON: Tişteki xerab e.

VLADIMIR (Ji Lucky re): Hûn çawan vê yekê bi wî dikin?

Gelekî şerm e! Bi mirovekî wilo! Ezabekî weha bide kişandin! Piştî evqas sal! Ev ne tişteki kirinê ye!

POZZO (Bi îskîn): Berê... bi nazikî...alîkariya min dikir... kêfa min tanî... hukum dida min... lê niha... min mehû dike...

ESTRAGON (Ji Vladimir re): Ma ew dixwaze di şûna wî de yekî din bigire?

VLADIMIR: Çawa?

ESTRAGON: Ew dixwaze di şûna wî de yekî din bigire, an jî ew ji wî pê ve yekî din naxwaze, min tam fêhm nekir.

VLADIMIR: Ez guman nakim.



ESTRAGON: Çawa?

VLADIMIR: Ez nizanim . ESTRAGON: Divê mirov ji wî bipirse.

POZZO (Ew haş bû ye): Hevalno, ez nizanim çi bi min hat.

Ez uzra xwe ji we dixwazim. Wan ji bîr bikin.

(Her ku diçe ew hê bêtir dibe hakimê xwe.) Ez

tam nizanim bê min çi gotine, lê hûn emîn bin ku

yek ji gotinên ku ez dibêjim jî ne rast bûn. (Ew radibe

ser xwe, kulman îî sînga xwe dixwe.) Ma ez di-

şibim yekî ku êşê dide kişandin, ha! De here ji

wir! (Bêrîkên xwe tev dide.) Min qalûna xwe xiste

ku?

VLADIMIR: Şeveke pir xweş e.

ESTRAGON: Nayê jibîrkirin.

VLADIMIR : Hê jî xelas nebûye.

ESTRAGON: Wilo dixuye.

VLADIMIR: Hê nû dest pê dike.

38

ESTRAGON: Ecêb.

VLADIMIR: Tu dibêjî qey em di pêşangehekê de ne.

ESTRAGON: Li sîrkê.

VLADIMIR: Li hêwaneke muzîkê.

ESTRAGON: Li sîrkê.

POZZO: Min darikê xwe xiste ku!

ESTRAGON: Çi mirovekî girgir e! Ew darikê xwe nabêhe!

(Bi hîke hîk dikene.)

VLADIMIR: Ez niha tîm. (Ber bi kûlîsê ve dimeşe.)

ESTRAGON: Li dawiya korîdorê, li milê çepê ye.

VLADIMIR: Cihê min bigire. (Derdikeve.)

POZZO: Ma min Aptulah winda kir.

ESTRAGON (Ji dil diketie.) Ew ê ev zilam min bikuje!

POZZO (Serê xwe radike.) Ma gelo we dît (dibîne ku ne Vladimir e. Xemgtn e.) Ox!... Çûye!...Bêê ku xêtir ji min bixwaze! Ev qet ne tevgereke nazik e! Gerek we ew neşanda, we nehiştta ew here.

ESTRAGON: Wî xwe bi xwe nehişt.

POZZO: Haaa! (Demek) baş e, em çi bikin?

ESTRAGON: Werin vir.

POZZO: Çima?

ESTRAGON: Gava ew were hûn ê wî bibînin.

POZZO: Yanî, ma tu dixwazî ku ez rabimser piyan?

ESTRAGON: Werin...werin! Bilezînin!

(Pozzo radibe ser xwe, ber bi Estragon ve dimeşe.)

ESTRAGON: Binêrin!

POZZO: Waweylê, waweylê, waweylê!

ESTRAGON: Qediya.

(Vladimir vedigere sehnê, rûyê wî daliqandiye, li Lucky diqelibe, pehînekê li kursiya ku tê girtin û vekirin, dixê, diçe vîalîû wîalî.)

39

ESTRAGON: Ecêb.

VLADIMIR: Tu dibêjî qey em di pêşangehekê de ne.

ESTRAGON: Li sîrkê.

VLADIMIR: Li hêwaneke muzîkê.

ESTRAGON: Li sîrkê.

POZZO: Min darikê xwe xiste ku!

ESTRAGON: Çi mirovekî girgir e! Ew darikê xwe nabêhe!  
(Bi hêke hêk dikene.)

VLADIMIR: Ez niha têm. (Ber bi kûlsê ve dimeşe.)

ESTRAGON: Li dawiya korîdorê, li milê çepê ye.

VLADIMIR: Cihê min bigire. (Derdikeve.)

POZZO: Ma min Aptulah winda kir.

ESTRAGON (Ji dil diketie.) Ew ê ev zilam min bikuje!

POZZO (Serê xwe radike.) Ma gelo we dît (dibîne ku ne Vladimir e. Xemgtn e.) Ox!... Çûye!...Bê ku xêtir ji min bixwaze! Ev qet ne tevgereke nazik e! Gerek we ew neşanda, we nehişt ew here.

ESTRAGON: Wî xwe bi xwe nehişt.

POZZO: Haaa! (Demek) baş e, em çî bikin?

ESTRAGON: Werin vir.

POZZO: Çima?

ESTRAGON: Gava ew were hûn ê wî bibînin.

POZZO: Yanî, ma tu dixwazî ku ez rabimser piyan?

ESTRAGON: Werin...werin! Bilezînin!

(Pozzo radibe ser xwe, ber bi Estragon ve dimeşe.)

ESTRAGON: Binêrin!

POZZO: Waweylê, waweylê, waweylê!

ESTRAGON: Qediya.

(Vladimir vedigere sehnê, rûyê wî daliqandiye, li Lucky diqelibe, pehînekê li kursiya ku tê girtin û vekirin, dixê, diçe vîalîû wîalî.)

39

POZZO: Ma ne razî ye?

ESTRAGON: Te tiştên xweş revandin. Heyf e.

(Vladimir radiweste, kursiyê rast dike, çûyin û hatina xwe didomîne, ew sakîntir e.)

POZZO: Sakîn dibe. (Li dora xwe dinihêre.) Ji xwe her tişt sakîn dibe, ez hîs dikim. Huzûreke mezin dadikeve.

Guhdarî bikin. (Destê xwe bilind dike) Pan radizê.

VLADIMIR (radiweste): Ma wê qet nebe şev?

(Hersê jî li esmên dinêrin.)

POZZO: Ger nebe hûn ê neçin, ez bawer im?

ESTRAGON: Çîk... Em nizanin...

POZZO: Lê ev pirr xwezayî ye, pirr xwezayî. Ger ez jî di şûna we de bûma, Godîn... Godet... Godt... her

çi be, hûn dizanin ez behsa kê dikim, ger min bikarîba ew bidîta, heya tarîtiya şevê daneketa ez

nediçûm cihekî. (Li kursiya ku vedibe dinihêre.)

Ez dixwazim rûnê, lê ez nizamim bê ez ê çawan rûnê.

ESTRAGON: Ma hûn dixwazin ez alîkariya we bikim?

POZZO: Belkî hûn ji min bixwazin.

ESTRAGON: Çawa?

POZZO: Ger hûn ji min bixwazin ku ez rûnê.

ESTRAGON: Ma wê bi kêrî karekî were?

POZZO: Ez bawer im.

ESTRAGON: Baş e. Biferme ezbenî, ji kerema xwe re rûnê.

POZZO: Na, na, ez rice dikim, çênabe. (Demek. Bi dengê nizim.) Hebekîsrar bikin.

ESTRAGON: Ji kerema xwe re wilo li ser lingan raneweste, tu ê serma bigirî.

POZZO: Gelowiloye?

ESTRAGON: Ez ji sedî sed emîn im.

40

POZZO: Ma ne razî ye?

ESTRAGON: Te tiştên xweş revandin. Heyf e.

(Vladimir radiweste, kursiyê rast dike, çûyin û hatina xwe didomîne, ew sakîntir e.)

POZZO: Sakîn dibe. (Li dora xwe dinihêre.) Ji xwe her tişt sakîn dibe, ez hîs dikim. Huzûreke mezin dadikeve.

Guhdarî bikin. (Destê xwe bilind dike) Pan radizê.

VLADIMIR (radiweste): Ma wê qet nebe şev?

(Hersê jî li esmên dinêrin.)

POZZO: Ger nebe hûn ê neçin, ez bawer im?

ESTRAGON: Çîk... Em nizanin...

POZZO: Lê ev pirr xwezayî ye, pirr xwezayî. Ger ez jî di şûna we de bûma, Godîn... Godet... Godt... her çi be, hûn dizanin ez behsa kê dikim, ger min bikarîba ew bidîta, heya tarîtiya şevê daneketa ez nediçûm cihekî. (Li kursiya ku vedibe dinihêre.) Ez dixwazim rûnê, lê ez nizamim bê ez ê çawan rûnê.

ESTRAGON: Ma hûn dixwazin ez alîkariya we bikim?

POZZO: Belkî hûn ji min bixwazin.

ESTRAGON: Çawa?

POZZO: Ger hûn ji min bixwazin ku ez rûnê.

ESTRAGON: Ma wê bi kêrî karekî were?

POZZO: Ez bawer im.

ESTRAGON: Baş e. Biferme ezbenî, ji kerema xwe re rûnê.

POZZO: Na, na, ez rice dikim, çênabe. (Demek. Bi dengê nizam.) Hebekîsrar bikin.

ESTRAGON: Ji kerema xwe re wilo li ser lingan raneweste, tu ê serma bigirî.

POZZO: Gelowiloye?

ESTRAGON: Ez ji sedî sed emîn im.

40

POZZO: Bêşik wek we ye. (Rûdinê.) Spas ezîzê min. Ev e, ez dîsan rûniştî me. (L/ saeta xwe dinihêre.) Lê ji bo ku ez dereng nemînim, divê ez ji we veqetim.

VLADIMIR: Dem rawestiya ye.

POZZO (Saetê dide ber guhê xwe): Guh mede vê, ez benî, bawer meke. (Saeta xwe dixê bêrika xwe.) Hûn baweriya xwe bi çî tînin bînin, lê baweriya xwe bi vê neyne.

ESTRAGON (Ji Pozzo re): Ew îro her tiştî reş dibîne.

POZZO: Ji bilî qubeya esmên. (Kêfa wîji espiriya wî re tê, dikene.) Hedan, ew ê jî bibe. Lê hûn hê nizanin, hûn ne ji vir in, hûn bi avaçûna roka vir nizanin.

Ma ez ji we re bêjim, bê çilo ye? (Bêdengî. Estragon û Vladimir ji nû ve, hem solêti xwe, hem jî

şewqên xwe di çav re derbas dikin. Şewqê Lucky ji serê wî de dikeve, ew ferq nake. ) Ez ê xwesteka

we bîname çih. (Ew aleta pijiqatidinê bikar tîtie.) Ji

kerema xwe re hebekî dîqet bike. (Estragon û Vladimir tevgerên xwe dom dikin, Lucky nîvrazayî

ye. Pozzo qemçiyê xwe dike şiqînî, lê dengê sivik ji qemçî derdikeve.) Ma çî bi vî qemçiyî hatiye,

yaho. (Radibe ser xwe, qemçî hê bêtir dike şîrqînî,  
dawî dengê ku ew dixwaze ji qêmçî derdikeve.

Lucky vediciniqe. Yê Estragon sola wî , yê

Vladimir jî şewqê wî ji destê wî dikeve. Pozzo qê-  
mçî davêje.) Ev qemçî baş xerab bûye. (L/ temaşevanan  
dinihêre.) Min çî digot?

VLADIMIR: Em herin.

ESTRAGON: Ji kerema xwe re wilo li ser lingan ranewestin,  
tu ê bêsebeb nexweş bikevî.

POZZO: Rast e. (Ew rûdine. Ji Estragon re) Navê te çî bû?

ESTRAGON: Catullus.

41

POZZO: Bêşik wek we ye. (Rûdinê.) Spas ezîzê min. Ev e,  
ez dîsan rûniştî me. (L/ saeta xwe dinihêre.) Lê ji  
bo ku ez dereng nemînim, divê ez ji we veqetim.

VLADIMIR: Dem rawestiya ye.

POZZO (Saetê dide ber guhê xwe): Guh mede vê, ez benî,  
bawer meke. (Saeta xwe dixê bêrîka xwe.) Hûn  
baweriya xwe bi çî tînin bînin, lê baweriya xwe bi  
vê neyne.

ESTRAGON (Ji Pozzo re): Ew îro her tiştî reş dibîne.

POZZO: Ji bilî qubeya esmên. (Kêfa wîji espiriya wî re tê,  
dikene.) Hedan, ew ê jî bibe. Lê hûn hê nizanin,  
hûn ne ji vir in, hûn bi avaçûna roka vir nizanin.

Ma ez ji we re bêjim, bê çilo ye? (Bêdengî. Estragon  
û Vladimir ji nû ve, hem solêti xwe, hem jî  
şewqên xwe di çav re derbas dikin. Şewqê Lucky  
ji serê wî de dikeve, ew ferq nake. ) Ez ê xwesteka

we bînime cih. (Ew aleta pijiqatidinê bikar tîtie.) Ji kerema xwe re hebekî dîqet bike. (Estragon û Vladimir tevgerên xwe dom dikin, Lucky nîvrazayî ye. Pozzo qemçiyê xwe dike şiqînî, lê dengê sivik ji qemçî derdikeve.) Ma çî bi vî qemçiyî hatiye, yaho. (Radibe ser xwe, qemçî hê bêtir dike şîrqînî, dawî dengê ku ew dixwaze ji qemçî derdikeve. Lucky vediciniqe. Yê Estragon sola wî , yê Vladimir jî şewqê wî ji destê wî dikeve. Pozzo qemçî davêje.) Ev qemçî baş xerab bûye. (L/ temaşevanan dinihêre.) Min çî digot?

VLADIMIR: Em herin.

ESTRAGON: Ji kerema xwe re wilo li ser lingan ranewestin, tu ê bêsebeb nexweş bikevî.

POZZO: Rast e. (Ew rûdine. Ji Estragon re) Navê te çî bû?

ESTRAGON: Catullus.

41

POZZO (guhdarî nekiriye.) Erê rast, şev. (Serê xwe radike) Lê, çî dibe, hebekî din jî bi dîqet bin. Ana na em ê negihîjin cihekî. (L/ esmên dinihêre.) Binêrin. (Ji bilî Luckyê ku ji nû ve li ber razanê ye her kes li esmên dinêrin. Pozzo ferq dike ku Lucky li ber razanê ye, xwe bi ben ve dadiliqîne.) Kuro beraz, li esmên binêre! (Lucky serê xwe bi paş ve dikişîm.) Çiyê vî yê wilo fewqelade heye, ha? Wek esman çiyê wî yê fewqelade heye? Di vê saetê de mîna her esmanê çilmisî û rohnî (Demek.) Hê ku hewa xweş e. (Peyva wî mîna strana ye)Berî bi saetekê



(L/ saeta xwe dinihêre, dengê wî t êkûz dibe) kê m zêde (dengê wîdtsan lîrîkî dibe) heya wê çaxê piştî ku wî çirên şewqê bi ser me de rijandin (radiweste, tona dengê wî nizim dibe) em bêjin saet ji dehê sibehê û bi vir de (dengê wî bilind dibe) biriqandinê şewqên sor û spî namînin, diçilmisin (bi herdu destan pêlik bi pêlik dadikeve) diçilmise, her ku diçe diçilmise, dawiyê (bêdengiyek dramatîk, bi herdu destan hereketên qêrqaş dike) trak! tamam! sar ma! (Bêdengî.) Lê (// bo agahiyê destên xwe hildide jor) lê, di pişt vê perdeya huzûrê de (çavên xwe ber bi esmên ve dike, ji bilî Lucky yêtt din jî wilo dikin) şev bi çargaviyê tê (dengê wî hê bêtir diricife) û wê were xwe biavêje ser me (tiliyên xwe li hev dixê) şaq! A wilo (îlham xelas dibe) di dema ku me herî bawer nedikir. (Bêdengî. Bi acizî) Ev wilo dibe, li vê dinyaya ka hp.

(Bêdengiyêke dirêj. )

ESTRAGON: Ger yek îkazekê bike.

VLADIMIR: dikane bête sebir kirin.

ESTRAGON: Tu dizanî wê çi bibe.

42

POZZO (guhdarî nekiriye.) Erê rast, şev. (Serê xwe radike)

Lê, çi dibe, hebekî din jî bi dîqet bin. Ana na em ê

negihîjin cihekî. (L/ esmên dinihêre.) Binêrin. (Ji

bilî Luckyê ku ji nû ve li ber razanê ye her kes li

esmên dinêrin. Pozzo ferq dike ku Lucky li ber razanê

ye, xwe bi ben ve dadiliqîne.) Kuro beraz, li

esmên binêre! (Lucky serê xwe bi paş ve dikişîm.)  
Çiyê vî yê wilo fewqelade heye, ha? Wek esman  
çiyê wî yê fewqelade heye? Di vê saetê de mîna  
her esmanê çilmisî û rohnî (Demek.) Hê ku hewa  
xweş e. (Peyva wî mîna strana ye) Berî bi saetekê  
(L/ saeta xwe dinihêre, dengê wî t êkûz dibe) kê  
zêde (dengê wîdtsan lîrîkî dibe) heya wê çaxê piştî  
ku wî çirên şewqê bi ser me de rijandin (radiweste,  
tona dengê wî nizim dibe) em bêjin saet ji dehê  
sibehê û bi vir de (dengê wî bilind dibe) biriqandinê  
şewqên sor û spî namînî, diçilmisin (bi herdu  
destan pêlik bi pêlik dadikeve) diçilmise, her ku  
diçe diçilmise, dawiyê (bêdengiyek dramatîk, bi  
herdu destan hereketên qêrqaş dike) trak! tamam!  
sar ma! (Bêdengî.) Lê (// bo agahiyê destên xwe  
hildide jor) lê, di pişt vê perdeya huzûrê de (çavên  
xwe ber bi esmên ve dike, ji bilî Lucky yêtt din jî  
wilo dikin) şev bi çargaviyê tê (dengê wî hê bêtir  
diricife) û wê were xwe biavêje ser me (tiliyên xwe  
li hev dixê) şaq! A wilo (îlham xelas dibe) di dema  
ku me herî bawer nedikir. (Bêdengî. Bi acizî) Ev  
wilo dibe, li vê dinyaya kaşp.

(Bêdengiyêke dirêj. )

ESTRAGON: Ger yek îkazekê bike.

VLADIMIR: dikane bête sebir kirin.

ESTRAGON: Tu dizanî wê çi bibe.

42

VLADIMIR: Tu xemgîn nabî.

ESTRAGON: Tu ê tenê rawestî.

VLADIMIR: Em hîn bûne. (Ji erdê radihîje şewqê xwe, li hundirê şewqe dinihêre, dawdişîne, dixê serê xwe.)

POZZO: We çawan ez dîtîm? (Estragon û Vladimir bêî ku fêhm bikin li wî dinihêrin.) Baş e? Îdare ye? Eh ma ev e? Ma adî ye? Ma berbat e?

VLADIMIR (pêşî ew fêhm dike): Oh, pir baş e, bi rastî jî baş e. POZZO (Ji Estragon re): Lê tu Mîrza?

ESTRAGON (Bi devoka îngilîzan): Oh, pir baş e, pir, pir, pir baş e.

POZZO (bi heyecan): Spas gelî Mîrzan! (demek.) Hewcedariya min bi mêrxasîbûnê heye. (Difikire) Li gorî destpêkê, ez li dor dawiyê baş bi ser neketim. Ma bala we nekişand?

VLADIMIR: Oh, belkî hebekî.

ESTRAGON: Ji min webû ku hûn bi zanebûn dikin.

POZZO: Ji ber ku di nav re mêjîyê min vala dibe, loma wilo dibe.

(Bêdengî)

ESTRAGON: Gava ez radiwestim jî qet tiştek nabe.

POZZO: (// ber ketiyê): Ma bêhna we teng dibe?

ESTRAGON: Herhal.

POZZO (Ji Vladimir re): Lê ya te, Mîrza?

VLADIMIR: Em mîna haran şahiyê dikin.

(Bêdengî. Pozzo bi xwe re di nava şerektdeye.)

POZZO: Begino, hûn li hemberî min... (// gotinê digere)... bêqusûr bûn.

ESTRAGON: Ez rice dikim!

VLADIMIR: Çi munasebet!

43

VLADIMIR: Tu xemgîn nabî.

ESTRAGON: Tu ê tenê rawestî.

VLADIMIR: Em hîn bûne. (Ji erdê radihîje şewqê xwe, li hundirê şewqe dinihêre, dawdişîne, dixê serê xwe.)

POZZO: We çawan ez dîtîm? (Estragon û Vladimir bêî ku fêhm bikin li wî dinihêrin.) Baş e? Îdare ye? Eh ma ev e? Ma adî ye? Ma berbat e?

VLADIMIR (pêşî ew fêhm dike): Oh, pir baş e, bi rastî jî baş e. POZZO (Ji Estragon re): Lê tu Mîrza?

ESTRAGON (Bi devoka îngilîzan): Oh, pir baş e, pir, pir, pir baş e.

POZZO (bi heyecan): Spas gelî Mîrzan! (demek.) Hewcedariya min bi mêrxasîbûnê heye. (Difikire) Li gorî destpêkê, ez li dor dawiyê baş bi ser neketim. Ma bala we nekişand?

VLADIMIR: Oh, belkî hebekî.

ESTRAGON: Ji min webû ku hûn bi zanebûn dikin.

POZZO: Ji ber ku di nav re mêjiyê min vala dibe, loma wilo dibe.

(Bêdengî)

ESTRAGON: Gava ez radiwestim jî qet tiştek nabe.

POZZO: (// ber ketiye): Ma bêhna we teng dibe?

ESTRAGON: Herhal.

POZZO (Ji Vladimir re): Lê ya te, Mîrza?

VLADIMIR: Em mîna haran şahiyê dikin.

(Bêdengî. Pozzo bi xwe re di nava şerektdeye.)

POZZO: Begino, hûn li hemberî min... (// gotinê digere)...

bêqusûr bûn.

ESTRAGON: Ez rice dikim!

VLADIMIR: Çi munasebet!

43

POZZO: Wilo ye, wilo ye, hûn mîna ku divabûna bûn. Ji

ber wê...ez jî niha ji xwe... dipirsim... gelo ez dikanim

çi ji van mirovên han ku aciz dibin re bikim.

ESTRAGON: Em bi zêrekî jî fît dibin.

VLADIMIR: Ma em parsek in.

POZZO: Ez dikanim çi bikim, min xwe bi xwe got, ma gelo

ez dikanim çi bikim ji bo dem bi wan ewqas dirêj

neyê? Min hestî da wan, ez bi wan re li ser her tiş

tî peyivîm, min ji wan re qala avaçûna rojê kir,

min ev hemû kirin. Ê hê gelek tiştên din. Lê, ma

gelo ev têr dikin? Ev e, ya ku hundurê min disoje

ev e, gelo ma ev têr dikin?

ESTRAGON: Sed wereqe jî çêdibe.

VLADIMIR: Dengê xwe bibire!

ESTRAGON: Temam, va ye me birî.

POZZO: Ma têr dike? Bê şik. Xûyê min pîs e. Lê dilê min

berz e. Ev roj wilo ye. Ger zerara min jî tê de hebc.(Xwe

davêje ben. Lucky li wî dinihêre.) Ji ber

ez dizanim ku ez ê êşê bikişînim. (Bê ku ew ji cihê

xwe rabe, daqûl dibe û radihîje qêmçî.) Tu kîjanê

çêtir dibînî? Bila ji we re dans bike, stranan bibê-

je, ji ber bixwîne, bifikire, an...

VLADIMIR: Kî ?

POZZO: Kî! Ma qey hûn nizanin bifikirin?

VLADIMIR: Ma ew difikire ?

POZZO: Bêqusûr. Bi dengê bilind. Ew berê dikarîbû gelekî xweştir bifikiriya, min dikarîbû bi saetan li wî guhdarî bikira. Niha...(Dilerize.) Eh, ma em çi bikin, tiştê ku wê bibûya bû. Ma hûn dixwazin ku ew tiştêkî ji bo we bifikire?

ESTRAGON: Min dixwest ew dansê bike, me ê hê bêtir şa-  
44

POZZO: Wilo ye, wilo ye, hûn mîna ku divabûna bûn. Ji ber wê...ez jî niha ji xwe... dipirsim... gelo ez dikanim çi ji van mirovên han ku aciz dibin re bikim.

ESTRAGON: Em bi zêrekî jî fît dibin.

VLADIMIR: Ma em parsek in.

POZZO: Ez dikanim çi bikim, min xwe bi xwe got, ma gelo ez dikanim çi bikim ji bo dem bi wan ewqas dirêj neyê? Min hestî da wan, ez bi wan re li ser her tiş tî peyivîm, min ji wan re qala avaçûna rojê kir, min ev hemû kirin. Ê hê gelek tiştên din. Lê, ma gelo ev têr dikin? Ev e, ya ku hundurê min disoje ev e, gelo ma ev têr dikin?

ESTRAGON: Sed wereqe jî çêdibe.

VLADIMIR: Dengê xwe bibire!

ESTRAGON: Temam, va ye me birî.

POZZO: Ma têr dike? Bê şik. Xûyê min pîs e. Lê dilê min berz e. Ev roj wilo ye. Ger zerara min jî tê de hebc.(Xwe

davêje ben. Lucky li wî dinihêre.) Ji ber ez dizanim ku ez ê êşê bikişînim. (Bê ku ew ji cihê xwe rabe, daqûl dibe û radihîje qêmçî.) Tu kîjanê çêtir dibînî? Bila ji we re dans bike, stranên bibêje, ji ber bixwîne, bifikire, an...

VLADIMIR: Kî ?

POZZO: Kî! Ma qey hûn nizanin bifikirin?

VLADIMIR: Ma ew difikire ?

POZZO: Bêqusûr. Bi dengê bilind. Ew berê dikarîbû gelekî xweştir bifikiriya, min dikarîbû bi saetan li wî guhdarî bikira. Niha...(Dilerize.) Eh, ma em çî bikin, tiştê ku wê bibûya bû. Ma hûn dixwazin ku ew tiştêkî ji bo we bifikire?

ESTRAGON: Min dixwest ew dansê bike, me ê hê bêtir şa-  
44

hîbikira.

POZZO: Ew yeka han hebekî bi şik e.

ESTRAGON: Ne wilo, ma me ê hê bêtir kêf nekira?

VLADIMIR: Ez guhdarîkirina fikra wî dixwazim.

ESTRAGON: Ma ew nikane pêşî dans bike û paşê bifikire?  
Ger em zêde tiştêkî din nexwazin.

VLADIMIR (// Pozzo re): Ma çêdibe?

POZZO: Ji xwe, ma ji wê hêsantdr çî heye. Yek jî qanûnên xwezayê jî wilo ne. (Kenekî kurt.)

VLADIMIR: Ger wilo be bila dans bike.

(Bêdengî.)

POZZO (Ji Lucky re): Ma tu dibîhîzî?

ESTRAGON: Ma kesên ku guh nedin gotinên wî hene?

POZZO: Ez ê vê yekê paşê ji we re bibêjim. (Ji Lucky re.)

Dansê bike, pîso!

(Lucky bahol û selikê datîne erdê, hebekî ber bi rampê ve dimeşe, berê xwe bi Pozzo vedike. Ji bo ku Estragon hê çêtir bibîne radibe ser piyan.

Lucky dansê dike û radiweste.)

ESTRAGON: Hemû ev bû?

POZZO: Hê! (Lucy eynî hereketan dike û radiweste.)

ESTRAGON: Ma ev jî îş e yaho, bêfedî! (Hereketên Lucky teqlît dike.) Ez jî dikanim ewqasî bikim. (Teqlît dike, ji bo ku nekeve xwe bi zorê digire.) Ji xwe, divê ez hebekî bixebitim.

VLADIMIR: Wî berê dikanîbû hemû şiklên dansan bikira, Xwe hol fikir, dipekiya. Ew niha bi tenê dikane vê bike. Tu dizane bê çi nav li vê kiriye?

ESTRAGON: Mirina fanosvan.

VLADIMIR: Kansera bi emir.

POZZO: Dansa torrê. Ew texmîn dike ku ew ketiye torrekê.

45

hîbikira.

POZZO: Ew yeka han hebekî bi şik e.

ESTRAGON: Ne wilo, ma me ê hê bêtir kêf nekira?

VLADIMIR: Ez guhdarîkirina fikra wî dixwazim.

ESTRAGON: Ma ew nikane pêşî dans bike û paşê bifikire? Ger em zêde tişteki din nexwazin.

VLADIMIR (// Pozzo re): Ma çêdibe?

POZZO: Ji xwe, ma ji wê hêsantdr çi heye. Yek jî qanûnên xwezayê jî wilo ne. (Kenekî kurt.)



VLADIMIR: Ger wilo be bila dans bike.

(Bêdengî.)

POZZO (Ji Lucky re): Ma tu dibîhîzî?

ESTRAGON: Ma kesên ku guh nedin gotinên wî hene?

POZZO: Ez ê vê yekê paşê ji we re bibêjim. (Ji Lucky re.)

Dansê bike, pîso!

(Lucky bahol û selikê datîne erdê, hebekî ber bi rampê ve dimeşe, berê xwe bi Pozzo vedike. Ji bo ku Estragon hê çêtir bibîne radibe ser piyan.

Lucky dansê dike û radiweste.)

ESTRAGON: Hemû ev bû?

POZZO: Hê! (Lucy eynî hereketan dike û radiweste.)

ESTRAGON: Ma ev jî îş e yaho, bêfedî! (Hereketên Lucky teqlît dike.) Ez jî dikanim ewqasî bikim. (Teqlît dike, ji bo ku nekeve xwe bi zorê digire.) Ji xwe, divê ez hebekî bixebitim.

VLADIMIR: Wî berê dikanîbû hemû şiklên dansan bikira, Xwe hol fikir, dipekiya. Ew niha bi tenê dikane vê bike. Tu dizane bê çi nav li vê kiriye?

ESTRAGON: Mirina fanosvan.

VLADIMIR: Kansera bi emir.

POZZO: Dansa torrê. Ew texmîn dike ku ew ketiye torrekê.

45

VLADIMIR: (Di cantengiya zanistiyekî spehîtiyê de): Çîka di çîkê de çîkek heye, lê dîsan jî çîk e. .. (Gava Lucky dest pê kir ku ber bi alavan here)

POZZO (mîna ku ji kerekî re bibêje): Şooş! (Lucky bê hereketdimtne.)

ESTRAGON: Ma ew hîç neguhdarîkirina gotina we dike?

POZZO: Ez ê vê yekê paşê ji we re şirove bikim. (Bêrîkên xwe tev dide.) Rawestin. (Dîsan tev dide.) Min hirmiya xwe xiste kû? (L/ bêrîkên xwe digere.) Ev ecêb e! (Ew serê xwe radike, şaş bûye, mîna ku bêhiş bûbe. Her ku diçe bi dengekî ku nayê bihîstin.) Cîhazê min ê bêhnê tune ye!

ESTRAGON (Her ku diçe bi dengekî ku nayê bihîstin): Kezeba min pir jar e. (Bi hêdîka dikuxe, bi dengekî xîze xîz)

POZZO (Bi detigê xwe yê xwezayî): Em çi bikin, ez jî bi kar naynim. Min çi digot... (Difikire.) Rawestin. (Difikire.) Çênabe! (Serê xwe radike.) Ez nabînim, alîkariya min bikin.

ESTRAGON: Ez lê digirim.

VLADIMIR: Ez jî.

POZZO: Em bifikirin!

(Hersê jî bi hev re şewqeyên xwe ji serên xwe dikin, destên xwe datînin ser eniyên xwe, ji ber bikaranîna qewetên xwe, rûyên wan qermiçî ne, wan bala xwe berdane ser derxistina tiştên ku Pozzo gotine. Bêdengiyê dirêj.)

ESTRAGON (mîna ku têderdixe): Hê!

VLADIMIR: Dît.

POZZO (bêsebir): Çi bû?

ESTRAGON: Ew çima yê di destên xwe de danayne erdê?

VLADIMIR: Ne ew e!

VLADIMIR: (Di cantengiya zanistiyekî spehîtiyê de): Çîka di çîkê de çîkek heye, lê dîsan jî çîk e. .. (Gava Lucky dest pê kir ku ber bi alavan here)

POZZO (mîna ku ji kerekî re bibêje): Şooş! (Lucky bê hereketdimtne.)

ESTRAGON: Ma ew hîç neguhdarîkirina gotina we dike?

POZZO: Ez ê vê yekê paşê ji we re şirove bikim. (Bêrîkên xwe tev dide.) Rawestin. (Dîsan tev dide.) Min hirmiya xwe xiste kû? (L/ bêrîkên xwe digere.) Ev ecêb e! (Ew serê xwe radike, şaş bûye, mîna ku bêhiş bûbe. Her ku diçe bi dengê ku nayê bihîstin.) Cîhazê min ê bêhnê tune ye!

ESTRAGON (Her ku diçe bi dengê ku nayê bihîstin): Kezeba min pir jar e. (Bi hêdîka dikuxe, bi dengê xîze xîz)

POZZO (Bi detigê xwe yê xwezayî): Em çî bikin, ez jî bi kar naynim. Min çî digot... (Difikire.) Rawestin. (Difikire.) Çênabe! (Serê xwe radike.) Ez nabînim, alîkariya min bikin.

ESTRAGON: Ez lê digerim.

VLADIMIR: Ez jî.

POZZO: Em bifikirin!

(Hersê jî bi hev re şewqeyên xwe ji serên xwe dikin, destên xwe datînin ser eniyên xwe, ji ber bikaranîna qewetên xwe, rûyên wan qermiçî ne, wan bala xwe berdane ser derxistina tiştên ku Pozzo gotine. Bêdengiyê dirêj.)

ESTRAGON (mîna ku têderdixe): Hê!

VLADIMIR: Dît.

POZZO (bêsebir): Çi bû?

ESTRAGON: Ew çima yên di destên xwe de danayne erdê?

VLADIMIR: Ne ew e!

46

POZZO: Tu êmin î?

VLADIMIR: Erê, te ew ji me re şirove kiribû.

POZZO: Min ji we re şirove kiribû?

VLADIMIR: Yê di destên xwe de jî danî erdê.

ESTRAGON (Çavekî diavêje hêla Lucky): Rast e. Baş e,  
danûstandina

di navbera wan de çi ye?

VLADIMIR: Li gorî ku wî tiştên di destên xwe de danîbin

erdê, êdî pirskirina me ya çima ew tiştên di destên

xwe de danayne erdê bêîmkan e. . . POZZO: Jîrîtiyeke mîna kevir e!

ESTRAGON: Baş e, ji bo çi wî alavên di destên xwe de danîn  
erdê?

POZZO: Temam.

VLADIMIR: Ji bo ku dansê bike.

ESTRAGON: Rast e.

POZZO (destê xwe bilind dike): Rawestin! (Demek.) Tiştêkî

nebêjin! (Demek.) Temam. (Şewqê xwe dide serêxwe.)

Çêbû.

(Estragon û Vladimir jî şewqên xwe didin serê  
xwe.)

VLADIMIR: Dît.

POZZO: Binêrin bê çawa dibe.

ESTRAGON: Çi çawa dibe?

POZZO: Hûn ê bibînin. Lê gotina wê zehmet e.

VLADIMIR: Wê çaxê mebêje.

POZZO: Na! Metirsin, dawî dawî ez ê bi ser bikevim. Di eslê xwe de ez naxwazim gotinê dirêj bikim, ji ber ku dereng e. Riya hem kurt, hem jî vekirî çî ye, ka tê derxin. Bihêlin ez hebekî bifikirim.

ESTRAGON: Dirêj bipeyive, wê hê kurttir bibe.

POZZO (fikirî ye.): Wê bibe. Binêrin, ya ew, ya ew.

ESTRAGON: Serma girtiye.

47

POZZO: Tu êmin î?

VLADIMIR: Erê, te ew ji me re şirove kiribû.

POZZO: Min ji we re şirove kiribû?

VLADIMIR: Yê di destên xwe de jî danî erdê.

ESTRAGON (Çavekî diavêje hêla Lucky): Rast e. Baş e, danûstandina di navbera wan de çî ye?

VLADIMIR: Li gorî ku wî tiştên di destên xwe de danîbin erdê, êdî pirskirina me ya çima ew tiştên di destên xwe de danayne erdê bêîmkan e. . . POZZO: Jîrîtiyeke mîna kevir e!

ESTRAGON: Baş e, ji bo çî wî alavên di destên xwe de danî erdê?

POZZO: Temam.

VLADIMIR: Ji bo ku dansê bike.

ESTRAGON: Rast e.

POZZO (destê xwe bilind dike): Rawestin! (Demek.) Tiştêkî nebêjin! (Demek.) Temam. (Şewqê xwe dide serêxwe.) Çêbû.

(Estragon û Vladimir jî şewqên xwe didin serê xwe.)

VLADIMIR: Dît.

POZZO: Binêrin bê çawa dibe.

ESTRAGON: Çi çawa dibe?

POZZO: Hûn ê bibînin. Lê gotina wê zehmet e.

VLADIMIR: Wê çaxê mebêje.

POZZO: Na! Metirsin, dawî dawî ez ê bi ser bikevim. Di eslê xwe de ez naxwazim gotinê dirêj bikim, ji ber ku dereng e. Riya hem kurt, hem jî vekirî çî ye, ka tê derxin. Bihêlin ez hebekî bifikirim.

ESTRAGON: Dirêj bipeyive, wê hê kurttir bibe.

POZZO (fikirî ye.): Wê bibe. Binêrin, ya ew, ya ew.

ESTRAGON: Serma girtiye.

47

POZZO: Ez tişteki ji wî dixwazim, danskirinê, gotina stranê, fikirandinê...

VLADIMIR: Temam, tamam, me fêhm kir.

POZZO: An jî ez tişteki naxwazim. Temam. Gotina min mebirin. Em bêjin ku... ez dixwazin ew dans bike, li ser qisê. Çi dibe?

ESTRAGON: Dest bi fikandinê dike.

POZZO (dilê wîmaye): Ez ê ji niha û pê ve hîç qala tişteki nekim.

VLADIMIR: Tu guh mede wî, ji kerema xwe re dom bikin.

POZZO: Lê hûn peyva min dibirin.

VLADIMIR: Dom bike, dom bike, pir bi heyecan e.

POZZO: Hebekî din jî li ser bisekinin.

ESTRAGON (destê xwe digihîne hev): Ez lava dikim, begê min, dom bike, behs bike.

POZZO: Ez li ku mabûm?

VLADIMIR: Hûn daxwaza dansê li wî dikin.

ESTRAGON: Daxwaza stranan.

POZZO: Temam, ez dixwazim ku ew stranan bibêje. Baş e, çi dibe? An mîna ku ez jê dixwazim ew stranan dibêje, an jî mîna ku ez jê dixwazim di şûna gotina stranan de, ser qisê, ew dest bi dansê dike, an dest bi fikirandinê, an jî...

VLADIMIR: Vekirî, eşkere wî girê bidin.

ESTRAGON: Beseyaho!

VLADIMIR: Lê ew îşev her tiştên ku hûn dixwazin dike.

ESTRAGON: Ev hemû vir in.

VLADIMIR: Tu ji ku dizanî ? ESTRAGON: Ew ê piştî bîstikeke din bi me bide zanîn ku gotineke te jî ne rast e.

VLADIMIR: (Ji Pozzo re): Tu îtiraz nakî ?

POZZO: Ez westiyayî me.

48

POZZO: Ez tiştêkî ji wî dixwazim, danskirinê, gotina stranê, fikirandinê...

VLADIMIR: Temam, temam, me fêhm kir.

POZZO: An jî ez tiştêkî naxwazim. Temam. Gotina min mebirin. Em bêjin ku... ez dixwazin ew dans bike, li ser qisê. Çi dibe?

ESTRAGON: Dest bi fîkandinê dike.

POZZO (dilê wîmaye): Ez ê ji niha û pê ve hîç qala tiştêkî

nekim.

VLADIMIR: Tu guh mede wî, ji kerema xwe re dom bikin.

POZZO: Lê hûn peyva min dibirin.

VLADIMIR: Dom bike, dom bike, pir bi heyecan e.

POZZO: Hebekî din jî li ser bisekinin.

ESTRAGON (destê xwe digihîne hev): Ez lava dikim, begê min, dom bike, behs bike.

POZZO: Ez li ku mabûm?

VLADIMIR: Hûn daxwaza dansê li wî dikin.

ESTRAGON: Daxwaza stranan.

POZZO: Temam, ez dixwazim ku ew stranan bibêje. Baş e, çi dibe? An mîna ku ez jê dixwazim ew stranan dibêje, an jî mîna ku ez jê dixwazim di şûna gotina stranan de, ser qisê, ew dest bi dansê dike, an dest bi fikirandinê, an jî...

VLADIMIR: Vekirî, eşkere wî girê bidin.

ESTRAGON: Beseyaho!

VLADIMIR: Lê ew îşev her tiştên ku hûn dixwazin dike.

ESTRAGON: Ev hemû vir in.

VLADIMIR: Tu ji ku dizanî ? ESTRAGON: Ew ê piştî bîstikeke din bi me bide zanîn ku gotineke te jî ne rast e.

VLADIMIR: (Ji Pozzo re): Tu îtiraz nakî ?

POZZO: Ez westiyayî me.

48

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Hîç tiştek nabe, hîç kesek nayê, ev tiştekî ecêb e.



VLADIMIR: (Ji Pozzo re): Ji wî re bêjin ku bila ew bifikire.  
POZZO: Şewqeyê wî bidinê.  
VLADIMIR: Şewqeyê wî ?  
POZZO: Ew bêê şewqe nikane bifikire.  
VLADIMIR (Ji Estragon re): Şewqeyê wî bidiyê.  
ESTRAGON: Ez! Piştî ku te ev bi min kirin? Qet!  
VLADIMIR: Wê çaxê ez ê bidimê. (Ji cihê xwe tevnalîve.)  
ESTRAGON: Bila ew bi xwe here bigire.  
POZZO: Dayin baştir e.  
VLADIMIR: Wê çaxê ez bidimê. (Şewqe ji erdê radike, dirê-  
jî Lucky dike. Lucky tevnalîve.)  
POZZO: Divê mirov têxe serê wî.  
ESTRAGON (Ji Pozzo re): Jê re bibêje bila rahêjîyê.  
POZZO: Ger hûn bidin serê wî wê baştir bibe.  
VLADIMIR: Ez ê bidim serê wî. (Bi dîqet li dora Lucky dizîvîre,  
hêdîka ji pişt ve nêzîk dibe, şewqe dixê serê  
wî û tavilê bi paş ve vedikişê. Lucky tevnalîve. Bê-  
dengî.)  
ESTRAGON: Li bendî çî ye?  
POZZO: Hebekî xwe bidin alî. (Estragon û Vladimir baş ji  
Lucky bi dûr dikevin. Pozz xwe diavêje ben,  
Lucky li wî dinihêre.) Bifikire, beraz! (Demek.  
Lucky dest bi dansê dike.) Raweste! (Lucky radiweste.)  
Bimeşe! (Lucky ber bi Pozzo ve dimeşe.)  
Temam! (Lucky radiweste.) Bifikire! (Demek.)  
LUCKY: Ji aliyê din ve mirov dikane bibêje ku...  
POZZO: Raweste! (Lucky dengê xwe dibire.) Bi paş ve here!  
(Lucky berepaş diçe.) Temam! (Lucky radiweste.)

Bizîvire milê rastê (Lucky berê xwe bi te-

49

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Hîç tişteke nabe, hîç kesek nayê, ev tişteki ecêb e.

VLADIMIR: (Ji Pozzo re): Ji wî re bêjin ku bila ew bifikire.

POZZO: Şewqeyê wî bidinê.

VLADIMIR: Şewqeyê wî ?

POZZO: Ew bêê şewqe nikane bifikire.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Şewqeyê wî bidiyê.

ESTRAGON: Ez! Piştî ku te ev bi min kirin? Qet!

VLADIMIR: Wê çaxê ez ê bidimê. (Ji cihê xwe tevnalîve.)

ESTRAGON: Bila ew bi xwe here bigire.

POZZO: Dayin baştir e.

VLADIMIR: Wê çaxê ez bidimê. (Şewqe ji erdê radike, dirê-  
jî Lucky dike. Lucky tevnalîve.)

POZZO: Divê mirov têxe serê wî.

ESTRAGON (Ji Pozzo re): Jê re bibêje bila rahêjîyê.

POZZO: Ger hûn bidin serê wî wê baştir bibe.

VLADIMIR: Ez ê bidim serê wî. (Bi dîqet li dora Lucky dizîvire,  
hêdîka ji pişt ve nêzîk dibe, şewqe dixê serê  
wî û taviyê bi paş ve vedikişê. Lucky tevnalîve. Bê-  
dengî.)

ESTRAGON: Li bendî çî ye?

POZZO: Hebekî xwe bidin alî. (Estragon û Vladimir baş ji  
Lucky bi dûr dikevin. Pozz xwe diavêje ben,  
Lucky li wî dinihêre.) Bifikire, beraz! (Demek.  
Lucky dest bi dansê dike.) Raweste! (Lucky radiweste.)

Bimeşe! (Lucky ber bi Pozzo ve dimeşe.)

Temam! (Lucky radiweste.) Bifikire! (Demek.)

LUCKY: Ji aliyê din ve mirov dikane bibêje ku...

POZZO: Raweste! (Lucky dengê xwe dibire.) Bi paş ve here!

(Lucky berepaş diçe.) Temam! (Lucky radiweste.)

Bizîvire milê rastê (Lucky berê xwe bi te-

49

maşevanan vedike.) Bifikire!

LUCKY

Estragon û Vladimir bi

balkêşiyeye

mezin

guhdarî

dikin. Herçî

Pozzo ye

mîna ku

betilî û

peios e.

Estragon û

Vladimir

dest bi buxbuxê

kirine. Êş û

kedera

Pozzo zêde

dibe.

(Bi yekcûreyî dipeyive): Li gorî delîlên di dest de

mirov dikane bêje ku mîna lêkolînên Poinçon û

Wattman ên dawî ên komunî ku nîşan didin mî

mî mî mîna he he he hebûna Xwedeyakî kesane  
ku nihêrîna ji jorî girikê derveyî dem û zemanî ya  
Xwedane î tevizî û lal tevizî û lal tevizî û lal ji bilî  
hinan di rastiya xwe de ji me hemûyan hez dike  
kengî û ji bo çî mirov nizane lê wê rojekê bête zanîn  
û Mîrendaya ku janê dikişîne bi yên din re yên  
din re mirov nizane ji bo çî ye lê wext heye di êşê  
de û agir û agir û agir di van alaviyên êgir de û hebekî  
jî dom bike hinek hinekên ên di nava êgir de  
ku bawer nakin wê dawiyê êgir bi textan bixin te  
fêhm kir û ca ca ca carna wê bibin esmanên hêşin  
dojehê wê bibe ewrên bêdeng bêdeng ew jî bi xêr  
û ser çavan hat lê divê ez pêşî ji dawiyê de dest pê  
bikim û wekî din jî ew lêkolînên ku tamam nebû-  
ne divê ez lêkolînên ku tamam nebûne dawiya  
wan ji serî ve dest pê bikim lê dîsan jî li gorî Akakakakakademiya  
Antropopopometriyê lêkolînên  
ku xe xe xe xelatkirî Testu û Conard nîşan dane  
ku ji Berneyê heta Bresseyê ji bilî şaşiya hesab bêî  
ku hîç cih bidin şaşiyêke din nîşan daye ku lêkolî-  
nên Testu û Conard yên netemambûyî netemambûyî  
dawiyê nîşan daye ku daye ku piştî vê vê te  
fêhm kir ez nizanim çima lê divê ez ji dawiyê ve dest pê bikim ji  
xebatên Poinçon û Wattman eşkere  
xuya dibe be be ku ku ku ku cehda Fartov û  
Belcher ya netemambûyî netemambûyî nayê zanîn  
bê ji çî ye lê lêkolîna Testu û Conard ya netemam-

50

maşevanan vedike.) Bifikire!

LUCKY

Estragon û Vladimir bi

balkêşiyeke

mezin

guhdarî

dikin. Herçî

Pozzo ye

mîna ku

betilî û

peios e.

Estragon û

Vladimir

dest bi buxbuxê

kirine. Êş û

kedera

Pozzo zêde

dibe.

(Bi yekcûreyî dipeyive): Li gorî delîlên di dest de mirov dikane bêje ku mîna lêkolînên Poinçon û Wattman ên dawî ên komunî ku nîşan didin mî mî mî mîna he he he hebûna Xwedeyakî kesane ku nihêrîna ji jorî girikê derveyî dem û zemanî ya Xwedane î tevizî û lal tevizî û lal tevizî û lal ji bilî hinan di rastiya xwe de ji me hemûyan hez dike kengî û ji bo çî mirov nizane lê wê rojekê bête zanîn û Mîrendaya ku janê dikişîne bi yên din re yên din re mirov nizane ji bo çî ye lê wext heye di êşê

de û agir û agir û agir di van alaviyên êgir de û hebekî  
jî dom bike hinek hinekên ên di nava êgir de  
ku bawer nakin wê dawiyê êgir bi textan bixin te  
fêhm kir û ca ca ca carna wê bibin esmanên hêşin  
dojehê wê bibe ewrên bédeng bédeng ew jî bi xêr  
û ser çavan hat lê divê ez pêşî ji dawiyê de dest pê  
bikim û wekî din jî ew lêkolînên ku tamam nebû-  
ne divê ez lêkolînên ku tamam nebûne dawiya  
wan ji serî ve dest pê bikim lê dîsan jî li gorî Akakakakakademiya  
Antropopopometriyê lêkolînên  
ku xe xe xe xelatkirî Testu û Conard nîşan dane  
ku ji Berneyê heta Bresseyê ji bilî şaşiya hesab bêî  
ku hîç cih bidin şaşiyeke din nîşan daye ku lêkolî-  
nên Testu û Conard yên netemambûyî netemambûyî  
dawiyê nîşan daye ku daye ku piştî vê vê te  
fêhm kir ez nizanim çima lê divê ez ji dawiyê ve dest pê bikim ji  
xebatên Poinçon û Wattman eşkere  
xuya dibe be be ku ku ku ku cehda Fartov û  
Belcher ya netemambûyî netemambûyî nayê zanîn  
bê ji çi ye lê lêkolîna Testu û Conard ya netemam-  
50

Estragon û Vladimir  
haş dibin û  
guhdarî  
dikin. Her  
ku diçe  
Pozzo  
nikane di

cihê xwe de  
raweste, dinale.  
Estragon û Vladimir  
dest bi qîrînê dikin.  
Pozzo xwe  
çem dike û  
radibe ser xwe. Xwe  
davêje ben.  
Hemû  
diqîrin.  
Lucky xwe bi ben ve dadiliqîne,  
dişewişe,  
heta ku jê tê  
diqîre.  
Hemû bi  
hev re xwe davêjin ser Lucky.  
Lucky ji  
aliyekê ve xwe diparêze ji  
aliyekê ve jî bi nefret  
diqîre.  
bûyî netemambûyî dixuye ku ku ku ku berevajiyê  
qenaeta mirovî li Bresseyê yê yê yê Testu û Conard  
mirov bi bi kurtî dawî dawî pêşketinên di  
xwedîkirinê de û digel pakijkirina gû hem zeyîf dibe  
hem jî nayê zanîn bê ji bo çî ye di paralelê vê  
de digel ku dest bi sporê kiriye hinek ek ek spor  
eynî nî nî nî wek futbol rev bîsîklet avjenî siwarî  
hawayî dînîtî tenîs wek mînak tenîs balafir an jî

şaxên sporê yê cihê wek mînak spora zivistanê  
spora havînê spora payizê spora payizê wek mî-  
nak tenîs wek mînak tenîs li ser mêrgê li meydanê  
tenîs li cihekî normal an jî firîn an jî wek mînak  
tenîs avjenî hespbezandin spora deryayê spora bê  
pensilîn dermanê şîrînkirinê bi kurrî ez dixwazim  
dubare bikim di eynî wextê de di paralela vê de  
nayê zanîn bê ji çi ye li hember tenîsê ez ji serî ve  
dest pê dikim hewayî golf neh qul hîjdeh qul ferq  
nake tenîsa bûzê bi kurtî nayê zanîn bê ji çi ye Li  
Seine'ê li Seine-et-Oise'yê li Seine-et-Marne'yê li  
Marme-et-Oise'yê te fêhm kir di eynî wextê de di  
paralelê vê de nayê zanîn bê ji çi ye zeyîf dibe teng  
dibe ez ji serî de dest pê dikim Oise Marne bi kurtî  
ji mirina Voltaire û vir ve xisara serê şexs di eslê  
xwe de xisara serê şexs bûye du perçe û sed gramî  
serê şexs di zik hev de hesabekî girover li Normandiyayê  
bi tazîti kîloyên baş nayê zanîn bê ji çi  
ye bi kurtî dawî dawî ne girîng e bûyer vekirî û zelal  
e û ji aliyê din ve jî ya cidîtir gava em bala xwe  
bidinê dumayikên cidîtir derdikeve holê ku ku ku  
di ronahiya ronahiya ceribandînê Steinweg û Petermann  
de li çolê li çiyayê û li peravan û çem û av  
agir hewa eynî û erd te fêhm kir hewa û erd dema

51

Estragon û Vladimir

haş dibin û

guhdarî



dikin. Her  
ku diçe  
Pozzo  
nikane di  
cihê xwe de  
raweste, dinale.  
Estragon û Vladimir  
dest bi qîrînê dikin.  
Pozzo xwe  
çem dike û  
radibe ser xwe. Xwe  
davêje ben.  
Hemû  
diqîrin.  
Lucky xwe bi ben ve dadiliqîne,  
dişewiçe,  
heta ku jê tê  
diqîre.  
Hemû bi  
hev re xwe davêjin ser Lucky.  
Lucky ji  
aliyekê ve xwe diparêze ji  
aliyekê ve jî bi nefret  
diqîre.  
bûyî netemambûyî dixuye ku ku ku berevajiyê  
qenaeta mirovî li Bresseyê yê yê yê Testu û Conard  
mirov bi bi kurtî dawî dawî pêşketinên di  
xwedîkirinê de û digel pakijkirina gû hem zeyîf dibe

hem jî nayê zanîn bê ji bo çi ye di paralelê vê  
de digel ku dest bi sporê kiriye hinek ek ek spor  
eynî nî nî nî wek futbol rev bîsîklet avjenî siwarî  
hawayî dînîtenîs wek mînak tenîs balafir an jî  
şaxên sporê yên cihê wek mînak spora zivistanê  
spora havînê spora payizê spora payizê wek mî-  
nak tenîs wek mînak tenîs li ser mêrgê li meydanê  
tenîs li cihekî normal an jî firîn an jî wek mînak  
tenîs avjenî hespbezandin spora deryayê spora bê  
pensilîn dermanê şîrînkirinê bi kurrî ez dixwazim  
dubare bikim di eynî wextê de di paralela vê de  
nayê zanîn bê ji çi ye li hember tenîsê ez ji serî ve  
dest pê dikim hewayî golf neh qul hîjdeh qul ferq  
nake tenîsa bûzê bi kurtî nayê zanîn bê ji çi ye Li  
Seine'ê li Seine-et-Oise'yê li Seine-et-Marne'yê li  
Marme-et-Oise'yê te fêhm kir di eynî wextê de di  
paralelê vê de nayê zanîn bê ji çi ye zeyîf dibe teng  
dibe ez ji serî de dest pê dikim Oise Marne bi kurtî  
ji mirina Voltaire û vir ve xisara serê şexs di eslê  
xwe de xisara serê şexs bûye du perçe û sed gramî  
serê şexs di zik hev de hesabekî girover li Normandiyayê  
bi tazîtenî kîloyên baş nayê zanîn bê ji çi  
ye bi kurtî dawî dawî ne girîng e bûyer vekirî û zelal  
e û ji aliyê din ve jî ya cidîtir gava em bala xwe  
bidinê dumayikên cidîtir derdikeve holê ku ku ku  
di ronahiya ronahiya ceribandinên Steinweg û Petermann  
de li çolê li çiyar û li peravan û çem û av  
agir hewa eynî û erd te fêhm kir hewa û erd dema

gelekî sar e hewa û erd ji bo keviran hatiye çêkirin  
 çi fêde dema gelekî sar e di demên heftemîn de hewa  
 erd derya di quntarên mezin de ji bo keviran  
 di sermayên pir de di deryayê de li reşayiyê û li hewa  
 wey lawo ez ê ji serî ve dest pê bikim nayê zanîn  
 bê çima digel tenîsê bûyer li holê ye nayê zanîn  
 bê çima ez ji serî ve dest pê dikim yê di dorê  
 de bila were bi kurtî dawiyê çi heyf e ku yê di dorê  
 de bila were ji bo keviran çima nebe ku ez ji  
 destpêkê ve bibêjim lê divê ez dawiyê ji nû ve bê-  
 jim ji destpêkê ve dibêjim di eynî wextê de di paralelê  
 vê de nayê zanîn bê çima digel tenîsê bila yê  
 di dorê de were rî alavî hêsirên çavan şipîşîn û kevirên  
 sakîn çi heyf e ku serî serî serî serî li Normadiyayê  
 digel tenîsê ku xebatên bêdûmayik û netemambûyî  
 kevirên cidîtir bi kurtî ez ji serî ve dest  
 pê dikim çi heyf e çi heyf e li Normandiyayê bêdû-  
 mayik netemambûyî serî serî li Normandiyayê digel  
 tenîsê serî çi heyf e ku kevir Conard Conard...  
 Xiyar, xiyar... (L/ hev dixin. Lucky çend carên  
 din jî diqîre.) Tenîs!... Kevir!... Pir bêdeng!... Conard!...  
 Xiyar!... Temambûyî!...  
 POZZO: Şewqeyê wî bigirin!  
 (Vladimir şewqeyê Lucky ji serê wî dadidê; Lucky  
 bêdeng dibe, dikeve xwarê. Bêdengiyeke mezin.  
 Yê ku di şer de bi ser ketine mîna kûrikê bêhna  
 xwe didin û distînin.)

ESTRAGON: Min tola xwe hılanî.

(Vladîmîr şewqeyê Lucky di çav re derbas dike; li hundurê wî dinihêre. )

POZZO: Wî bide min! (Sewqe ji destê Vladîmîr dikişîne û davêje erdê, pê lê dikiyê.) Ka bila ew careke din

52

gelekî sar e hewa û erd ji bo keviran hatiye çêkirin  
çi fêde dema gelekî sar e di demên heftemîn de hewa  
erd derya di quntarên mezin de ji bo keviran  
di sermayên pir de di deryayê de li reşayiyê û li hewa  
wey lawo ez ê ji serî ve dest pê bikim nayê zanîn  
bê çima digel tenîsê bûyer li holê ye nayê zanîn  
bê çima ez ji serî ve dest pê dikim yê di dorê  
de bila were bi kurtî dawiyê çi heyf e ku yê di dorê  
de bila were ji bo keviran çima nebe ku ez ji  
destpêkê ve bibêjim lê divê ez dawiyê ji nû ve bê-  
jim ji destpêkê ve dibêjim di eynî wextê de di paralelê  
vê de nayê zanîn bê çima digel tenîsê bila yê  
di dorê de were rî alavî hêsirên çavan şipîşîn û kevirên  
sakîn çi heyf e ku serî serî serî serî li Normandiyayê  
digel tenîsê ku xebatên bêdûmayik û netemambûyî  
kevirên cidîtir bi kurtî ez ji serî ve dest  
pê dikim çi heyf e çi heyf e li Normandiyayê bêdû-  
mayik netemambûyî serî serî li Normandiyayê digel  
tenîsê serî çi heyf e ku kevir Conard Conard...  
Xiyar, xiyar... (L/ hev dixin. Lucky çend carên  
din jî diqîre.) Tenîs!... Kevir!... Pir bêdeng!... Conard!...  
Xiyar!... Temambûyî!...

POZZO: Şewqeyê wî bigirin!

(Vladimir şewqeyê Lucky ji serê wî dadidê; Lucky bêdeng dibe, dikeve xwarê. Bêdengiyeke mezin. Yê ku di şer de bi ser ketine mîna kûrikê bêhna xwe didin û distînin.)

ESTRAGON: Min tola xwe hilanî.

(Vladîmîr şewqeyê Lucky di çav re derbas dike; li hundurê wî dinihêre. )

POZZO: Wî bide min! (Sewqe ji destê Vladîmîr dikişîne û davêje erdê, pê lê dikiyê.) Ka bila ew careke din

bifikire ez wî bibînim!

VLADIMIR: Ma ew ê bikaribe îstiqameta xwe bibîne?

POZZO: Ez ê wî bajom ser îstiqameta wî. (Pehînan li Lucky dide.) Rabe ser xwe! Beraz!

ESTRAGON: Belkî jî miriye.

VLADIMIR: Hûn ê wî bikujin.

POZZO: Rabe ser xwe! Cehemî! (Xwe bi ben ve dadiliqîne, Luycky xwe bi erdê ve dikişkişîne û hebekî radibe. Ji Estragon û Vladîmîr re) Alîkariya min bikin.

VLADIMIR: Ma em dikanin çi bikin?

POZZO: Wî rakin ser lingan!

(Estragon û Vladimir Lucky radikin ser lingan, demekê bi wî digirin, paşê wî berdidin. Lucky dikeve xwarê.)

ESTRAGON: Ji min evqas.

VLADIMIR: Were, em careke din biceribînin.

ESTRAGON: Ev me dixê şûna çi?

VLADIMIR: Heydê were.

(Lucky radikin ser lingan, bi wîdigirin.)

POZZO: Wî bernedin ha! (Estragon û Vladimir dihejin.)

Tevnelivin! (Pozzo diçe radihêje bahol û selikê, ttne

ji Lucky re.) Baş pê bigirin! (Baholê dixê destê

Lucky; Lucky tavilê berdide.) Baholê bernedin!

(Dîsan eynî herehetan dikan. Lucky hêdî hêdî fêrî

baholê dibe, di dawiyê de tiliyên wî fêrî sapên baholê

dibin.) Bernedin ha! (Bi selikê jî eynî hereket.)

Temam hûn dikanin berdî. (Estragon û Vladimir

ji ba Lucky bi dûr dikevin; Lucky diheje,

tewş dimeşe, mîna ku dike bikeve, lê dawî bahol û

selik di dest de li ser lingan dimîne. Pozzo xwe bi

paş ve dikişîne, qamçiyê xwe dike şîrqînî.) Temam,

dikaer bimeşe. (Dizîvire ser Estragon û Vla-

53

bifikire ez wî bibînim!

VLADIMIR: Ma ew ê bikaribe îstiqameta xwe bibîne?

POZZO: Ez ê wî bajom ser îstiqameta wî. (Pehînan li

Lucky dide.) Rabe ser xwe! Beraz!

ESTRAGON: Belkî jî miriye.

VLADIMIR: Hûn ê wî bikujin.

POZZO: Rabe ser xwe! Cehemî! (Xwe bi ben ve dadiliqîne,

Lucky xwe bi erdê ve dikişkişîne û hebekî radibe.

Ji Estragon û Vladîmîr re) Alîkariya min bikin.

VLADIMIR: Ma em dikanin çî bikin?

POZZO: Wî rakin ser lingan!

(Estragon û Vladimir Lucky radikin ser lingan,

demekê bi wî digirin, paşê wî berdidin. Lucky dikeve xwarê.)

ESTRAGON: Ji min evqas.

VLADIMIR: Were, em careke din biceribînin.

ESTRAGON: Ev me dixê şûna çî?

VLADIMIR: Heydê were.

(Lucky radikin ser lingan, bi wî digirin.)

POZZO: Wî bernedin ha! (Estragon û Vladimir dihejin.)

Tevnelivin! (Pozzo diçe radihêje bahol û selikê, tne

ji Lucky re.) Baş pê bigirin! (Baholê dixê destê

Lucky; Lucky tavilê berdide.) Baholê bernedin!

(Dîsan eynî herehetan dikan. Lucky hêdî hêdî fêrî

baholê dibê, di dawiyê de tiliyên wî fêrî sapên baholê

dibin.) Bernedin ha! (Bi selikê jî eynî hereket.)

Temam hûn dikanin berdin. (Estragon û Vladimir

ji ba Lucky bi dûr dikevin; Lucky diheje,

tewş dimeşe, mîna ku dike bikeve, lê dawî bahol û

selik di dest de li ser lingan dimîne. Pozzo xwe bi

paş ve dikişîne, qamçiyê xwe dike şîrqînî.) Temam,

dikaer bimeşe. (Dizîvire ser Estragon û Vla-

53

dimir) Spas Mîrzano, destûr bidin ku ez we - (Li

bêrîkên xwe digere) - xwesteka herî baş - (digere)

- xwesteka herî baş- (Digere.) Çênabe! (Serê xwe

radike; rûyê wî tevlihev bûye. ) Saeteke bi kostek e,

dibiriqê. Mîrzano, saniyek jî şaş nedikir. Kalikê

min ew dabû min. (Lê digere.) Belkî jî ez fikirîm.

(Li erdê lê digere; Estragon û Vladimir jî lê digerin.

Pozzo perçeyên ku ji şewqeyê Lucky maye bi  
lingan diqulupîne. ) Ev kêmbû ha ! VLADIMIR: Dibe ku di bêrika  
êlegê te de be.

POZZO: Rawestin. (Xwe daqûl dike, serê xwe nêzîkê zikê  
xwe dike, guhdarî dike.) Ez tiştê nabihîzim. (Ji  
wan re îşaret dike ku ew nêzîkê bibin.) Werin binerin.  
(Estragon û Vladimir diçin ba wî, xwe ber bi  
zikê wîve ditewînin. Bêdengî.) Divê hûn dengê tik  
tika wê bibihîzin.

VLADIMIR: Deng mekin!

(Hemûyan xwe daqûl kirine, guhdarî dikan.)

ESTRAGON: Ez tiştinan dibihîzim.

POZZO: Jiku?

VLADIMIR: Ew dilê wî ye.

POZZO (Hêviya wî şikestiye): Bicehem!

VLADIMIR: Hiş bin!

(Guhdarî dikan.)

ESTRAGON: Dibe ku jî sekinê be.

(Dirastînin.)

POZZO: Bêhna genî ji kê ji we tê?

ESTRAGON: Yê wî bêhn ji devê wî tê, yê min jî ji lingên  
min.

POZZO: Ez ê ji we veqetim.

ESTRAGON: Lê, saeta te?

POZZO: Herhal min li qesrê hiştiye.

54

dimir) Spas Mîrzano, destûrê bidin ku ez we - (Li  
bêrikên xwe digere) - xwesteka herî baş - (digere)



- xwesteka herî baş- (Digere.) Çênabe! (Serê xwe radike; rûyê wî tevlihev bûye. ) Saeteke bi kostek e, dibiriqe. Mîrzano, saniyek jî şaş nedikir. Kalikê min ew dabû min. (Lê digere.) Belkî jî ez fikirîm. (Li erdê lê digere; Estragon û Vladimir jî lê digerin. Pozzo perçeyên ku ji şewqeyê Lucky maye bi lingan diqulupîne. ) Ev kêmbû ha ! VLADIMIR: Dibe ku di bêrîka êlegê te de be.

POZZO: Rawestin. (Xwe daqûl dike, serê xwe nêzîkî zikê xwe dike, guhdarî dike.) Ez tiştê nabihîzim. (Ji wan re îşaret dike ku ew nêzîk bibin.) Werin binerin. (Estragon û Vladimir diçin ba wî, xwe ber bi zikê wîve ditewînin. Bêdengî.) Divê hûn dengê tika wê bibihîzin.

VLADIMIR: Deng mekin!

(Hemûyan xwe daqûl kirine, guhdarî dikan.)

ESTRAGON: Ez tiştinan dibihîzim.

POZZO: Jiku?

VLADIMIR: Ew dilê wî ye.

POZZO (Hêviya wî şikestiye): Bicehem!

VLADIMIR: Hiş bin!

(Guhdarî dikan.)

ESTRAGON: Dibe ku jî sekinî be.

(Dirastînin.)

POZZO: Bêhna genî ji kê ji we tê?

ESTRAGON: Yê wî bêhn ji devê wî tê, yê min jî ji lingên min.

POZZO: Ez ê ji we veqetim.

ESTRAGON: Lê, saeta te?

POZZO: Herhal min li qesrê hiştiye.

54

ESTRAGON: Wê çaxê oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

ESTRAGON: Oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

ESTRAGON: Oxir be.

(Bêdengî. Kes ji cihê xwe tevnalive.)

VLADIMIR: Oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

VLADIMIR: Oxir be.

(Bêdengî.)

POZZO: Spas.

VLADIMIR: Spas ji te re jî.

POZZO: Ez rice dikim.

ESTRAGON: Rice dikim.

POZZO: Rice dikim.

VLADIMIR: Rice dikim.

ESTRAGON: Rice dikim.

(Bêdengî.)

POZZO: Ez dikim... (Gotina xwe temam nake)... nikanim herim.

ESTRAGON: Tiştên weha dibin.

(Pozzo bi paş de vedigere, ji Lucky bi dûr dikeve, gava ber bi kulîsê ve diçe ben sist dike.)

VLADIMIR: Em ber bi hêla şaş ve diçin.

POZZO: Divê ez bişidim. (Gava tê dawiya ben radiweste,

bi paş de vedigere, diqîre.) Rê bidin! (Estragon û Vladimir ber bi fottê ve vedikşin, li Pozzo dinêrin. Dengê qêmçî.) Bi pêş ve! (Lucky tevnalîve.)

ESTRAGON: Bi pêş ve!

VLADIMIR: Bi pêş ve!

(Dengê qamçî. Lucky destpê dike û dimeşe.)

POZZO: Hê zûtir! (Ji kulîsê derbasî sehnê dibe, di pêşiya

55

ESTRAGON: Wê çaxê oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

ESTRAGON: Oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

ESTRAGON: Oxir be.

(Bêdengî. Kes ji cihê xwe tevnalîve.)

VLADIMIR: Oxir be.

POZZO: Bi xatirê we.

VLADIMIR: Oxir be.

(Bêdengî.)

POZZO: Spas.

VLADIMIR: Spas ji te re jî.

POZZO: Ez rice dikim.

ESTRAGON: Rice dikim.

POZZO: Rice dikim.

VLADIMIR: Rice dikim.

ESTRAGON: Rice dikim.

(Bêdengî.)

POZZO: Ez dikim... (Gotina xwe temam nake)... nikanim herim.

ESTRAGON: Tiştên weha dibin.

(Pozzo bi paş de vedigere, ji Lucky bi dûr dikeve, gava ber bi kulîsê ve diçe ben sist dike.)

VLADIMIR: Em ber bi hêla şaş ve diçin.

POZZO: Divê ez bişidim. (Gava tê dawiya ben radiweste, bi paş de vedigere, diqîre.) Rê bidin! (Estragon û Vladimir ber bi fottê ve vedikşin, li Pozzo dinêrin.

Dengê qêmçî.) Bi pêş ve! (Lucky tevnaive.)

ESTRAGON: Bi pêş ve!

VLADIMIR: Bi pêş ve!

(Dengê qamçî. Lucky destpê dike û dimeşe.)

POZZO: Hê zûtir! (Ji kulîsê derbasî sehnê dibe, di pêşiya 55

Lucky de di sehnê de derbas dibe. Estragon û Vladimir şewqeyên xwe derdixin, dest dihejînin.

Lucky derdikeve. Pozzo ben û qêmçî dike şîrqînî.)

Hê zûtir! hê zûtir! (Gava ew jîji sehnê derdikeve, radiweste û bi paş de vedigere, ben dişide. Ji kulîsê dengê ku gava Lucky dikeve tête bihîstin.) Kursiya min! (Vladimir diçe, kursiya ku tê vekirin û girtin tîne, dide Pozzo; ew jî ber bi Lucky ve divirvirîtie.)

Di xweşiyê de bimînin!

ESTRAGON û VLADIMIR (Dest dihejînin): Di xweşiyê de bimînin! Di xweşiyê de bimînin!

POZZO: Rabe ser xwe! Beraz! (Dengê gava Lucky radibe ser xwe tête bihîstin.) Bi pêş ve! (Pozzo derdikeve.

Dengê qamçî.) Bi pêş ve! Di xweşiyê de bimînin!

Hê zûtir! Beraz! Ço! di xweşiyê de bimînin!

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Wext da derbaskirin.

ESTRAGON: Bê wî jî derbas dibû.

VLADIMIR: Erê, lê hêdîtir.

(Kurtedemek.)

ESTRAGON: Em niha çi bikin?

VLADIMIR: Nizanim.

ESTRAGON: Heydê, em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

(Kurtedemek.)

VLADIMIR: Pir hatine guhertin.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Ev herdu.

ESTRAGON: Temam, heydê em bîskê bipeyivin.

56

Lucky de di sehnê de derbas dibe. Estragon û Vladimir şewqeyên xwe derdixin, dest dihejînin.

Lucky derdikeve. Pozzo ben û qêmçî dike şîrqînî.)

Hê zûtir! hê zûtir! (Gava ew jîji sehnê derdikeve, radiweste û bi paş de vedigere, ben dişide. Ji kulîsê dengê ku gava Lucky dikeve tête bihîstin.) Kursiya min! (Vladimir diçe, kursiya ku tê vekirin û girtin tîne, dide Pozzo; ew jî ber bi Lucky ve divirvirîtie.)

Di xweşiyê de bimînin!

ESTRAGON û VLADIMIR (Dest dihejînin): Di xweşiyê de

bimînin! Di xweşiyê de bimînin!

POZZO: Rabe ser xwe! Beraz! (Dengê gava Lucky radibe ser xwe tête bihîstin.) Bi pêş ve! (Pozzo derdikeve.

Dengê qamçî.) Bi pêş ve! Di xweşiyê de bimînin!

Hê zûtir! Beraz! Ço! di xweşiyê de bimînin!

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Wext da derbaskirin.

ESTRAGON: Bê wî jî derbas dibû.

VLADIMIR: Erê, lê hêdîtir.

(Kurtedemek.)

ESTRAGON: Em niha çi bikin?

VLADIMIR: Nizanim.

ESTRAGON: Heydê, em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

(Kurtedemek.)

VLADIMIR: Pir hatine guhertin.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Ev herdu.

ESTRAGON: Temam, heydê em bîskê bipeyivin.

56

VLADIMIR: Ma pir nehatine guhertin?

ESTRAGON: Dibe. Tenê em nikanin di guhertinan de bi ser bikevin.

VLADIMIR: Ma dibe? Bûye. Ma te ew nedîtin?

ESTRAGON: Tu çawa bixwazî. Lê ez wan nas nakim.

VLADIMIR: Tu çawan nas nakî?

ESTRAGON: Ez nas nakim.

VLADIMIR: Ez ji te re dibêjim, em wan nas dikin. Tu her tiştî ji bîr dikî. (Kurtedemek.) Ger ew yên berê bin, ew tişteki din.

ESTRAGON: Bi delîl, wan em nas nekirin.

VLADIMIR: Ev ne tu delîl e. Min jî mîna ew nas nekirin.

Ya rastî jî tu kes tu deman me nas nakin.

ESTRAGON: Bes e. Yê pêwîst - Ay! (Vladimir xwe qet tevnalivîne.)  
Ay!

VLADIMIR: Ger ew ne eynî bin, ew tişteki din.

ESTRAGON: Didi! Lingê min yê din! (Gava perde vedibe, dikule û diçe cihê ku berê lê rûniştibû.)

DENGEK JI KULÎSÊ: Mîrza!

(Estragon radiweste. Herdu jî li aliyê ku dengê jê tê dinihêrin.)

ESTRAGON: Dîsan dest pê dike.

VLADIMIR: Nêzîk bibe, LAWIKÊ min.

(Lawikekî ciwan bi şermokî dikeve hundur. Radiweste.)

LAWIK: Mîrza Albert!

VLADIMIR: Ez im.

ESTRAGON: Tu çi dixwazî?

VLADIMIR: Nêzîk bibe.

(Lawik ji cihê xwe tevnalibe.)

ESTRAGON (Diqîre): Ji te re hat gotin ku nêzîk bibe!

(Lawik bi fedyokî hebekt ber bi pêş ve diçe, radi-

57

VLADIMIR: Ma pir nehatine guhertin?

ESTRAGON: Dibe. Tenê em nikanin di guhertinan de bi ser bikevin.

VLADIMIR: Ma dibe? Bûye. Ma te ew nedîtin?

ESTRAGON: Tu çawa bixwazî. Lê ez wan nas nakim.

VLADIMIR: Tu çawan nas nakî?

ESTRAGON: Ez nas nakim.

VLADIMIR: Ez ji te re dibêjim, em wan nas dikin. Tu her tiştî ji bîr dikî. (Kurtedemek.) Ger ew yên berê bin, ew tişteki din.

ESTRAGON: Bi delîl, wan em nas nekirin.

VLADIMIR: Ev ne tu delîl e. Min jî mîna ew nas nekirin.

Ya rastî jî tu kes tu deman me nas nakin.

ESTRAGON: Bes e. Yê pêwîst - Ay! (Vladimir xwe qet tevnalivîne.)  
Ay!

VLADIMIR: Ger ew ne eynî bin, ew tişteki din.

ESTRAGON: Didi! Lingê min yê din! (Gava perde vedibe, dikule û diçe cihê ku berê lê rûniştibû.)

DENGEK JI KULÎSÊ: Mîrza!

(Estragon radiweste. Herdu jî li aliyê ku dengê jê tê dinihêrin.)

ESTRAGON: Dîsan dest pê dike.

VLADIMIR: Nêzîk bibe, LAWIKÊ min.

(Lawikekî ciwan bi şermokî dikeve hundur. Radiweste.)

LAWIK: Mîrza Albert!

VLADIMIR: Ez im.

ESTRAGON: Tu çi dixwazî?

VLADIMIR: Nêzîk bibe.

(Lawik ji cihê xwe tevnalibe.)



ESTRAGON (Dîqîre): Ji te re hat gotin ku nêzîk bibe!

(Lawik bi fedyokî hebekt ber bi pêş ve diçe, radi-

57

weste.)

VLADIMIR: Çi ye?

LAWIK: Mîrza Godot - (Bêdeng dibe.)

VLADIMIR: Ji xwe. (Kurtebêdengiyek.) Nêzîk bibe.

(Lawik ji cihê xwe tevnalibe.)

ESTRAGON (Dîqîre): Ji te re nêzîk bibe, hate gotin! (Lawik

bi şermokî hebekt berepêş diçe, radiweste.) Tu

çima evqasî dereng mayî?

VLADIMIR: Te ji Mîrza Godot tu nûçe anîne?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Wê çaxê bêje.

ESTRAGON: Tu çima evqasî dereng mayî?

(Lawik nizatîe bê wê bersiva kîjanî ji wan bide,

hem li wî hem jî li yê din dinihêre. )

VLADIMIR (Ji Estragon re): Wî rehet bihêle.

ESTRAGON: Di eslê xwe de tu min rehet bihêle. (Berepêş

diçe, ji lêwik re) ma tu dizanî saet çend e?

LAWIK: (Berepaş diçe): Tu sûcê min tune ye, Mîrza!

ESTRAGON: Wê çaxê sûcê min e.

LAWIK: Ez tirsîyabûm, Mîrza.

ESTRAGON: Ji kê? Ji me? (Bêdengiyek.) Bipeyive!

VLADIMIR: Ez fêhm dikim, yê din ew rirsandin.

ESTRAGON: Tu ji kengî ve li vir î?

LAWIK: Ne ji zû ve, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu ji qamçî tirsîya?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADÎMRÎ: Jiqîrînan?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ji wan herdu peyan?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu wan nasdikî?

LAWIK: Na, Mîrza.

58

weste.)

VLADIMIR: Çi ye?

LAWIK: Mîrza Godot - (Bêdeng dibe.)

VLADIMIR: Ji xwe. (Kurtebêdengiyek.) Nêzîk bibe.

(Lawik ji cihê xwe tevnalibe.)

ESTRAGON (Dîqîre): Ji te re nêzîk bibe, hate gotin! (Lawik

bi şermokî hebekt berepêş diçe, radiweste.) Tu

çima evqasî dereng mayî?

VLADIMIR: Te ji Mîrza Godot tu nûçe anîne?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Wê çaxê bêje.

ESTRAGON: Tu çima evqasî dereng mayî?

(Lawik nizatîe bê wê bersiva kîjanî ji wan bide,

hem li wî hem jî li yê din dinihêre. )

VLADIMIR (Ji Estragon re): Wî rehet bihêle.

ESTRAGON: Di eslê xwe de tu min rehet bihêle. (Berepêş

diçe, ji lêwik re) ma tu dizanî saet çend e?

LAWIK: (Berepaş diçe): Tu sûcê min tune ye, Mîrza!

ESTRAGON: Wê çaxê sûcê min e.

LAWIK: Ez tirsîyabûm, Mîrza.

ESTRAGON: Ji kê? Ji me? (Bêdengiyek.) Bipeyive!

VLADIMIR: Ez fêhm dikim, yên din ew rirsandin.

ESTRAGON: Tu ji kengî ve li vir î?

LAWIK: Ne ji zû ve, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu ji qamçî tirsiya?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADÎMRÎ: Jiqîrînan?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ji wan herdu peyan?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu wan nasdikî?

LAWIK: Na, Mîrza.

58

VLADIMIR: Ma tu ji vir î?

LAWIK: Erê, Mîrza.

ESTRAGON: Ev hemû derew in! (Bi milên lêwik digire û dihejîtte.) Ji me re rastiyê bêje!

LAWIK (Dilerize): Ev rastî ye, Mîrza.

VLADIMIR: Wî rehet bihêle! Çiyê te heye! (Estragon lêwik berdide û berepaş diçe, bi destan rûyê xwe dinuxumîne.

Vladimir û lawik li wî dinêrin. Estragon destêti xwe ji ber çavên xwe didin alî. Rûyê wî tevlihev bûye.) Çi bûye?

ESTRAGON: Ez ne dilşa me.

VLADIMIR: Derewan neke! Ji kengî û pê ve?

ESTRAGON: Min ji bîr kiribû.

VLADIMIR: Bi lîstikên wilo bi mirov dilîze. (Estragon dixwaze tiştinan bibêje, jê digere, dikule û diçe li cihê

xwe rûditie, mijûl dibe ku solên xwe ji lingên xwe derxe. Ji lêwik re) Min çi digot?

LAWIKMîrzaGodot...

VLADIMIR (Peyva wî dibire): Min berê jî tu dîtibû ne wilo?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma te ez nas nekirim?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu do jî nehatibû?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ev cara pêşî ye tu tê?

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Weha tê gotin. (Kurtedemek.) Baş e, dewam bike.

LAWIK (Di bêhnekê de): Mîrza Godot ji min re got ku here ji wan re bêje, ez ê îro nikanibim werim, lê sibehê

59

VLADIMIR: Ma tu ji vir î?

LAWIK: Erê, Mîrza.

ESTRAGON: Ev hemû derew in! (Bi milên lêwik digire û dihejîtte.) Ji me re rastiyê bêje!

LAWIK (Dilerize): Ev rastî ye, Mîrza.

VLADIMIR: Wî rehet bihêle! Çiyê te heye! (Estragon lêwik berdide û berepaş diçe, bi destan rûyê xwe dinuxumîne.

Vladimir û lawik li wî dinêrin. Estragon

destêti xwe ji ber çavên xwe didin alî. Rûyê wî tevlihev bûye.) Çi bûye?

ESTRAGON: Ez ne dilşa me.

VLADIMIR: Derewan neke! Ji kengî û pê ve?

ESTRAGON: Min ji bîr kiribû.

VLADIMIR: Bi lîstikên wilo bi mirov dilîze. (Estragon dixwaze tiştinan bibêje, jê digere, dikule û diçe li cihê xwe rûditie, mijûl dibe ku solên xwe ji lingên xwe derxe. Ji lêwik re) Min çi digot?

LAWIKMîrzaGodot...

VLADIMIR (Peyva wî dibire): Min berê jî tu dîtibû ne wilo?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma te ez nas nekirim?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu do jî nehatibû?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ev cara pêşî ye tu tê?

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Weha tê gotin. (Kurtedemek.) Baş e, dewam bike.

LAWIK (Di bêhnekê de): Mîrza Godot ji min re got ku here ji wan re bêje, ez ê îro nikanibim werim, lê sibehê

59

ji sedî sed ez ê werim.

VLADIMIR: Hemû ev bû?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu li ba Mîrza Godot dixebitî?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Tu çi karî dikî?

LAWIK: Ez şivanê bizinan im, Mîrza.

VLADIMIR: Ew li hember te baş e?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ew li te dixe?

LAWIK: Na, Mîrza, ew li min naxe.

VLADIMIR: Ew li kê dixe?

LAWIK: Ew li birayê min dixe, Mîrza.

VLADIMIR: Ha! Ma birayekî te heye?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Baş e, çima ew li te naxe?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma têra te xwarinê dide te? (Lawik dudilî dibe.)

Ma xwarina baş dide te?

LAWIK: Bi têra xwe baş e, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu ne xemgîn î? (Lawik dudilî dibe.) Ma

dengê min tê te?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: De bêje!

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu nizanî bê tu dilşa yî an na?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Mîna min e. (Kurtedemek.) Tu li ku radizê?

LAWIK: Di navbera zikê xênî de, Mîrza.

VLADIMIR: Bi birayê xwe re?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Di nava kayê de?

60

ji sedî sed ez ê werim.

VLADIMIR: Hemû ev bû?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu li ba Mîrza Godot dixebitî?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Tu çi karî dikî?

LAWIK: Ez şivanê bizinan im, Mîrza.

VLADIMIR: Ew li hember te baş e?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ew li te dixe?

LAWIK: Na, Mîrza, ew li min naxe.

VLADIMIR: Ew li kê dixe?

LAWIK: Ew li birayê min dixe, Mîrza.

VLADIMIR: Ha! Ma birayekî te heye?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Baş e, çima ew li te naxe?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma têra te xwarinê dide te? (Lawik dudilî dibe.)

Ma xwarina baş dide te?

LAWIK: Bi têra xwe baş e, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu ne xemgîn î? (Lawik dudilî dibe.) Ma dengê min tê te?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: De bêje!

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Ma tu nizanî bê tu dilşa yî an na?

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

VLADIMIR: Mîna min e. (Kurtedemek.) Tu li ku radizê?

LAWIK: Di navbera zikê xênî de, Mîrza.

VLADIMIR: Bi birayê xwe re?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Di nava kayê de?

60

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Kurtedemek.)

VLADIMIR: Baş e, heydê here.

LAWIK: Ez ji Mîrza Godot re çi bibêjim, Mîrza?

VLADIMIR: Ji wî re... (Dudilî dibe.) Ji wî re bêje ku te em dîtin.

(Kurtedemek.) Te em dîtin, ne wilo?

LAWIK: Erê, Mîrza. (Berepaş diçe, radiweste, dizîvire û bi bazdan derdikeve.)

(Şewq jî bi carekê ve kêr dibe. Tabilê dibe şev. Ji pişt hîv hiltê, bi ezmên ve bilind dibe, şewqeke ji rengê zîv davêje sehnê.)

VLADIMIR: Herî dawî! (Estragon radibe ser xwe, ber bi Vladimir ve diçe; her du solên wî jî di destê wt de ne. Solên xwe datîtte ba rapmê, dîk dibe, li hîvê dinihêre.) Tu çi dikî?

ESTRAGON: Tiştê ku tu dikî ez jî dikim, ez li vî rûyê çilmisî dinêrim.

VLADIMIR: Ez dibêjim solên te.

ESTRAGON: Ez li wir dihêlim. (Kurtedemek.) Ger yekî ku li min çûye were û lingên wî ji yên min biçûktir bin, bila ew bi van solan dilşa bibe.

VLADIMIR: Lê tu nikarî xwas bimeşî.

ESTRAGON: Îsa xwas meşiyaye.

VLADIMIR: Îsa. Tu dixwazî çi bibêjî? Tu çawan dikanî xwe



beramberî îsa bikî?

ESTRAGON: Min di hemû jiyana xwe de her xwe beramberî wî kiriye.

VLADIMIR: Lê wir germ bû! Hewa jî xweş bû!

ESTRAGON: Erê. Û taviê mirov li çarmîxê dixistdn.  
(Bêdengî.)

VLADIMIR: Tiştêkî me î ku em li vir bikin êdî nemaye.

61

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Kurtedemek.)

VLADIMIR: Baş e, heydê here.

LAWIK: Ez ji Mîrza Godot re çi bibêjim, Mîrza?

VLADIMIR: Ji wî re... (Dudilî dibe.) Ji wî re bêje ku te em dîtin.

(Kurtedemek.) Te em dîtin, ne wilo?

LAWIK: Erê, Mîrza. (Berepaş diçe, radiweste, dizîvire û bi bazdan derdikeve.)

(Şewq jî bi carekê ve kê m dibe. Taviê dibe şev. Ji pişt hîv hiltê, bi ezmên ve bilind dibe, şewqeke ji rengê zîv davêje sehnê.)

VLADIMIR: Herî dawî! (Estragon radibe ser xwe, ber bi Vladimir ve diçe; her du solên wîjî di destê wt de ne. Solên xwe datîtte ba rapmê, dîk dibe, li hîvê dinihêre.) Tu çi dikî?

ESTRAGON: Tiştê ku tu dikî ez jî dikim, ez li vî rûyê çilmisî dinêrim.

VLADIMIR: Ez dibêjim solên te.

ESTRAGON: Ez li wir dihêlim. (Kurtedemek.) Ger yekî ku

li min çûye were û lingên wî ji yên min biçûktir  
bin, bila ew bi van solan dilşa bibe.

VLADIMIR: Lê tu nikarî xwas bimeşî.

ESTRAGON: îsa xwas meşiyaye.

VLADIMIR: îsa. Tu dixwazî çi bibêjî? Tu çawan dikanî xwe  
beramberî îsa bikî?

ESTRAGON: Min di hemû jiyana xwe de her xwe beramberî  
wî kiriye.

VLADIMIR: Lê wir germ bû! Hewa jî xweş bû!

ESTRAGON: Erê. Ê taviê mirov li çarmîxê dixistdn.  
(Bêdengî.)

VLADIMIR: Tişteki me î ku em li vir bikin êdî nemaye.

61

ESTRAGON: Li tu cikehî din jî nemaye.

VLADIMIR: Binêr, Gogo, wilo meke. Wê sibe her tdşt xweş-  
tir bibe.

ESTRAGON: Wê çawan bibe?

VLADIMIR: Ma te nebihîst bê lêwik çi got?

ESTRAGON: na.

VLADIMIR: Wî got ku sibehe ji sedî sed wê Godot were.

(Kurtedemek.) Ma bi te tu maneya vê tuneye?

ESTRAGON: Ger wilo be em li vir rawestin.

VLADIMIR: Ma te aqilê xwe winda kiriye? Divê em ji xwe  
re cihekî êmin bibînin. (Bi milê Estragon digire.)

Were. (Estragon dikşîne. Estragon pêşî mîna ku  
diçe dike, paşê li ber xwe dide. Radiwestin.)

ESTRAGON (Li darê dinihêre): Çi heyf e ku qetek benê me  
jî tuneye.

VLADIMIR: Were. Dinya sar dibe. (Estragon dikişîne. Eynî hereket.)

ESTRAGON: Di bîra min de bîne ku ez sibehê ben bînim.

VLADIMIR: Çêdibe. Were. (Estragon dikişîne. Eynî hereket.)

ESTRAGON: Ji kengî ve ye em her bi hev re ne?

VLADIMIR: Ez nizanim. Belkî pêncî sal in.

ESTRAGON: Ma tê bîra te gava min xwe avêtibû çemê Duranceyê?

VLADIMIR: Em li maseran bûn.

ESTRAGON: Te ez ji avê derxistibûm.

VLADIMIR: Ew mir û çûn.

ESTRAGON: Kincên min li ber tavê ziwa bûbûn.

VLADIMIR: Edî li wan nefikire, heydê were. (Eynî hereket.)

ESTRAGON: Raweste.

VLADIMIR: Min sar e.

62

ESTRAGON: Li tu cikehî din jî nemaye.

VLADIMIR: Binêr, Gogo, wilo meke. Wê sibe her tdşt xweş-tir bibe.

ESTRAGON: Wê çawan bibe?

VLADIMIR: Ma te nebihîst bê lêwik çi got?

ESTRAGON: na.

VLADIMIR: Wî got ku sibehê ji sedî sed wê Godot were. (Kurtedemek.) Ma bi te tu maneya vê tuneye?

ESTRAGON: Ger wilo be em li vir rawestin.

VLADIMIR: Ma te aqilê xwe winda kiriye? Divê em ji xwe re cihekî êmin bibînin. (Bi milê Estragon digire.)

Were. (Estragon dikşîne. Estragon pêşî mîna ku diçe dike, paşê li ber xwe dide. Radiwestin.)

ESTRAGON (Li darê dinihêre): Çi heyf e ku qetek benê me jî tune.

VLADIMIR: Were. Dinya sar dibe. (Estragon dikişîne. Eynî hereket.)

ESTRAGON: Di bîra min de bîne ku ez sibehê ben bînim.

VLADIMIR: Çêdibe. Were. (Estragon dikişîne. Eynî hereket.)

ESTRAGON: Ji kengî ve ye em her bi hev re ne?

VLADIMIR: Ez nizanim. Belkî pêncî sal in.

ESTRAGON: Ma tê bîra te gava min xwe avêtibû çemê Duranceyê?

VLADIMIR: Em li maseran bûn.

ESTRAGON: Te ez ji avê derxistibûm.

VLADIMIR: Ew mir û çûn.

ESTRAGON: Kincên min li ber tavê ziwa bûbûn.

VLADIMIR: Edî li wan nefikire, heydê were. (Eynî hereket.)

ESTRAGON: Raweste.

VLADIMIR: Min sar e.

62

ESTRAGON: Ez xwe bi xwe dipirsim, gelo em bi serê xwe bimana û bi riya xwe de biçûna wê ne çêtir bûya.

(Demek.) Em ne rêwiyên eynî riyê ne.

VLADIMIR: (Bê dilmayîn): Ew ne belî ye.

ESTRAGON: Tiştek ne belî ye.

VLADIMIR: Ger tu difikirî wê baştir be, em her tim dikanin ji hev veqetin.

ESTRAGON: Ferq nake.

(Bê dengî.)

VLADIMIR: Rast e, ji niha pê ve ferq nake.

(Bê dengî.)

ESTRAGON: Ê, ma em diherin?

VLADIMIR: Em herin.

(Ji cihên xwe tevnalivin.)

Perde

63

ESTRAGON: Ez xwe bi xwe dipirsim, gelo em bi serê xwe bimana û bi riya xwe de biçûna wê ne çêtir bûya.

(Demek.) Em ne rêwiyên eynî riyê ne.

VLADIMIR: (Bê dilmayîn): Ew ne belê ye.

ESTRAGON: Tiştek ne belê ye.

VLADIMIR: Ger tu difikirî wê baştir be, em her tim dikanin ji hev veqetin.

ESTRAGON: Ferq nake.

(Bê dengî.)

VLADIMIR: Rast e, ji niha pê ve ferq nake.

(Bê dengî.)

ESTRAGON: Ê, ma em diherin?

VLADIMIR: Em herin.

(Ji cihên xwe tevnalivin.)

Perde

63

PERDEYA DUWEMÎN

Dotira rojê. Eynîdem. Eynîcih.

Solên Estragon kabikên wan bi hev ve, pozikên wan dûrî hev li nêzîkî rampê ne; şewqeyê Lucky jî lieynîcihîye.

Daran pel dane.

VLADIMIR bi hereketên jîndar dikeve hundur.

Radiweste, dûr û dirêj li darê dinihêre. Paşê, tavi lê bi xurtî di sehnê de diçe û tê. Li pêşberî solan dîsan bêhereket dimîne, daqûl dibe, radihîje ferekê, di çav re derbas dike, bêhn dike, paşê bi îhtimam datîne cihê berê. Dîsan dest bi çûyin û hatina xwe ya bi telaş dike. Li ber kulîsa milê çepê radiweste, destê xwe dide ber çavên xwe û demekê li dûr dinihêre. Dîsan digere. Li ber kulîsa milê çepê radiweste eynt herketan dike. Digere. Ji nişkê ve radiweste, destên xwe li sînga xwe digertne, serê xwe ber bi paş ve dirêj dike û bi zare zar stranekê dibêje:

VLADIMIR:

Segek hat...

(Ji ber ku wî bi nizmî dest pê kiriye, radiweste, dikuxe, bi dengekî bilind dest pê dike.)

64

PERDEYA DUWEMÎN

Dotira rojê. Eynîdem. Eynîcih.

Solên Estragon kabikên wan bi hev ve, pozikên wan dûrî hev li nêzîkî rampê ne; şewqeyê Lucky jî lieynîcihîye.

Daran pel dane.

VLADIMIR bi hereketên jîndar dikeve hundur.

Radiweste, dûr û dirêj li darê dinihêre. Paşê, tavi lê bi xurtî di sehnê de diçe û tê. Li pêşberî solan dîsan bêhereket dimîne, daqûl dibe, radihîje ferekê, di çav re derbas dike, bêhn dike, paşê bi îhtimam

datîne cihê berê. Dîsan dest bi çûyin û hatina xwe  
ya bi telaş dike. Li ber kulîsa milê çepê radiweste,  
destê xwe dide ber çavên xwe û demekê li dûr dinihêre.  
Dîsan digere. Li ber kulîsa milê çepê radiweste  
eynt herketan dike. Digere. Ji nişkê ve radiweste,  
destên xwe li sînga xwe digertne, serê xwe  
ber bi paş ve dirêj dike û bi zare zar stranekê dibê-  
je:

VLADIMIR:

Segek hat...

(Ji ber ku wî bi nizmî dest pê kiriye, radiweste, dikuxe,  
bi dengê bilind dest pê dike.)

64

p'j'l

Segek kete mûtfaxê

Dev avête sosîsan.

Xwarinpêj rahişt satorê

Segî da ber satoran

Segên din ku ew dîtin

Tavilê ew veşartin . . .

(Radiweste, kûr difikire, paşê dîsan dest pê dike:)

Segên din ku ew dîtin

Tavilê ew veşartin

Di binê xaçeke spî de

Ev gotin nivîsandin:

Segek kete mûtfaxê

Dev avête sosîsan

Xwarinpêj rahişt satorê

Segî da ber satoran.

Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin ...

(Radiweste. Eynî hereket.)

Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin. . .

(Radiweste. Eynthereket. Bi dengekî nizimtir:)

Tavilê ew veşartin. . .

65

p'j'l

Segek kete mûtfaxê

Dev avête sosîsan.

Xwarinpêj rahişt satorê

Segî da ber satoran

Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin . . .

(Radiweste, kûr difikire, paşê dîsan dest pê dike:)

Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin

Di binê xaçeke spî de

Ev gotin nivîsandin:

Segek kete mûtfaxê

Dev avête sosîsan

Xwarinpêj rahişt satorê

Segî da ber satoran.

Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin ...

(Radiweste. Eynî hereket.)



Segên din ku ew dîtîn

Tavilê ew veşartin. . .

(Radiweste. Eynthereket. Bi dengekî nizimtir:)

Tavilê ew veşatin. . .

65

(Radiweste. Dentekê bêhereket dimîne, paşê di sehnê de diçe û tê. Dîsan li ber darê radiweste, dizîvire, li ber solan radiweste, digere, ber bi kulîsa çepê ve baz dide, li dûr dinihêre, ber bi kulîsa rastê ve baz dide, li dûr dinihêre. Di vê navê de Estragon ji kulîsa çepê ve dikeve hundur, xwas e, serê wî di ber wî de ye, hêdîka di sehnê re derbas dibe.

VLADIMIR li pişt xwe dizîvire, wî dibîtte. )

VLADIMIR: Wey, dîsan tu yî! (Estragon radiweste, lê serê xwe bilind nake. VLADIMIR ber bi wî ve diçe.)

Ka were ez te hemêz bikim!

ESTRAGON: Dest min nede!

( VLADIMIR bi xemgînî xwesteka xwe nîvcîdihêle. Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma ez herim? (Demek.) Gogo! (Demek. VLADIMIR bi dîqet li wî dinihêre.) Ma wan li te xistin?

(Demek.) Gogo! (Serê Estragon di ber wî de ye û her bêdeng e.) Te şeva xwe li ku derbas kir?

(Bêdengî. VLADIMIR ber bi Estragon ve diçe.)

ESTRAGON: Dest min nede! Tişteki jî nepirse! Tişteki jî nebêje! Li ba min bimîne!

VLADIMIR: Ma min qet terka te kiriye?

ESTRAGON: Lê tu ji neçûyina min re jî nebûyî asteng.

VLADIMIR: Li min binêre! (Estragon tevnaîve. Bi dengekî bigurmîn) li min binêre, ez dibêjim!

(Estragon serê xwe hildide. Herdu jî mîna ku î berhemeke hunerî binêrin, bi paş ve vedikişin, bi pêş ve diçin, serê xwe bi kêtekên xwe ve ditewînin, her ku diçe hê bêtir dilerizin, nêzîkî hev dibin û bi carekê ve hevdu hemêz dikin; li piştên hev dixin. Dawiya hevduhemêzkirinê. Edî ji bo ku kes bi Estragon nagire, ew dike bikeve.)

66

(Radiweste. Dentekê bêhereket dimîne, paşê di sehnê de diçe û tê. Dîsan li ber darê radiweste, dizîvire, li ber solan radiweste, digere, ber bi kulîsa çepê ve baz dide, li dûr dinihêre, ber bi kulîsa rastê ve baz dide, li dûr dinihêre. Di vê navê de Estragon ji kulîsa çepê ve dikeve hundur, xwas e, serê wî di ber wî de ye, hêdîka di sehnê re derbas dibe.

VLADIMIR li pişt xwe dizîvire, wî dibîtte. )

VLADIMIR: Wey, dîsan tu yî! (Estragon radiweste, lê serê xwe bilind nake. VLADIMIR ber bi wî ve diçe.)

Ka were ez te hemêz bikim!

ESTRAGON: Dest min nede!

( VLADIMIR bi xemgînî xwesteka xwe nîvcîdihêle. Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma ez herim? (Demek.) Gogo! (Demek. VLADIMIR bi dîqet li wî dinihêre.) Ma wan li te xistin? (Demek.) Gogo! (Serê Estragon di ber wî de ye û her bêdeng e.) Te şeva xwe li ku derbas kir?

(Bêdengî. VLADIMIR ber bi Estragon ve diçe.)

ESTRAGON: Dest min nede! Tişteki jî nepirse! Tişteki jî nebêje!

Li ba min bimîne!

VLADIMIR: Ma min qet terka te kiriye?

ESTRAGON: Lê tu ji neçûyina min re jî nebûyî asteng.

VLADIMIR: Li min binêre! (Estragon tevnaîve. Bi dengê bigurmîn) li min binêre, ez dibêjim!

(Estragon serê xwe hildide. Herdu jî mîna ku î berhemeke hunerî binêrin, bi paş ve vedikişin, bi pêş ve diçin, serê xwe bi kêtekên xwe ve ditewînin, her ku diçe hê bêtir dilerizin, nêzîkî hev dibin û bi carekê ve hevdu hemêz dikin; li piştên hev dixin. Dawiya hevduhemêzkerinê. Edî ji bo ku kes bi Estragon nagire, ew dike bikeve.)

66

ESTRAGON: Çi roj e!

VLADIMIR: Kê wilo tu daye ber çoyan? Bibêje.

ESTRAGON: Ev e, rojêke din jî derbas bû.

VLADIMIR: Hê derbas nebûye.

ESTRAGON: Ji niha pê ve çî dibe bila bibe lê îro ji bo min xelas bûye. (Bêdengî.) Te berî kêliyê stran digot, deng hate min.

VLADIMIR: Rast e, tê bîra min.

ESTRAGON: Li zora min çû. Min xwe bi xwe got, ku ew li wir bi tenê ye, stranan dibêje; û ew bawer e ku ez ê careke din venegerim.

VLADIMIR: Tu ê çî bikî, xû ye. Min hemû rojê xwe di forma xwe de hîs kir. (Demek.) Ez bi şev jî qet şiyar

nebûm, carekê jî.

ESTRAGON: (Bi êmint): Va ye ez dibînim, gava ez ne li ba te bim tu baştir dimîzî.

VLADIMIR: Min bêriya te kiriye - lê di eynî wextê de jî ez dilşa me. Ne ecêb e?

ESTRAGON (Dilê wîmaye): Tu dilşa bû?

VLADIMIR (Piştî ku difikire): Belkî jî tam ne ew gotin e ya ku hîsên min tîne ziman.

ESTRAGON: Başe, mha?

VLADIMIR (// tiştê ku wê bibêje difikire): Niha... erê... gava ez çavên xwe digirim (ew çavên xwe digire û destên xwe datîne ser çavên xwe, ji bo bawer be ku çavên wî girtî ne) . . . ez niha hîs dikim... erê... ku şewqa di ser min re. (Çavên xwe vedike.) Niha tu li vir î û niha (çavêtt xwe digire, xwe konsantre dike), ez niha hîs dikim ku her tiştên di hundurê min de reş dibin. Ma ne ecêb e?

ESTRAGON: Tu dibîni, gava ez bi te re me ji te re xerabtir e . Ez jî gava bi tenê bim ez xwe baştir hîs dikim.

67

ESTRAGON: Çi roj e!

VLADIMIR: Kê wilo tu daye ber çoyan? Bibêje.

ESTRAGON: Ev e, rojeke din jî derbas bû.

VLADIMIR: Hê derbas nebûye.

ESTRAGON: Ji niha pê ve çî dibe bila bibe lê îro ji bo min xelas bûye. (Bêdengî.) Te berî kêliyê stran digot, deng hate min.

VLADIMIR: Rast e, tê bîra min.

ESTRAGON: Li zora min çû. Min xwe bi xwe got, ku ew li wir bi tenê ye, stranan dibêje; û ew bawer e ku ez ê careke din venegerim.

VLADIMIR: Tu ê çî bikî, xû ye. Min hemû rojê xwe di forma xwe de hîs kir. (Demek.) Ez bi şev jî qet şiyar nebûm, carekê jî.

ESTRAGON: (Bi êmint): Va ye ez dibînim, gava ez ne li ba te bim tu baştir dimîzî.

VLADIMIR: Min bêriya te kiriye - lê di eynî wextê de jî ez dilşa me. Ne ecêb e?

ESTRAGON (Dilê wîmaye): Tu dilşa bû?

VLADIMIR (Piştî ku difikire): Belkî jî tam ne ew gotin e ya ku hîsên min tîne ziman.

ESTRAGON:Başe,mha?

VLADIMIR (// tiştê ku wê bibêje difikire): Niha... erê... gava ez çavên xwe digirim (ew çavên xwe digire û destên xwe datîne ser çavên xwe, ji bo bawer be ku çavên wî girtî ne) . . . ez niha hîs dikim... erê... ku şewqa di ser min re. (Çavên xwe vedike.) Niha tu li vir î û niha (çavêtt xwe digire, xwe konsantre dike), ez niha hîs dikim ku her tiştên di hundurê min de reş dibin. Ma ne ecêb e?

ESTRAGON: Tu dibîni, gava ez bi te re me ji te re xerabtir e . Ez jî gava bi tenê bim ez xwe baştir hîs dikim.

67

VLADIMIR (Dilê wî maye): Ger wilo be ji bo çî tu her tim vedigerî vir?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Lê ez dizanim. Ji ber ku tu nikanî xwe biparêzî. Ger ez li ba te bûma, min nedihîşt tu lêdanê bixwî.

ESTRAGON: Tu nikanîbû bibûya asteng.

VLADIMIR: Çima?

ESTRAGON: Ew deh kes bûn.

VLADIMIR: Yanî, ez ê ji rewşa ku te ê lêdan bixwara re bibûma asteng.

ESTRAGON: Min tiştê nedikir ku.

VLADIMIR: Wê çaxê ji bo çi wan li te dan?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Na, ev e tu dibînî, Gogo, hin tiştên ku tu fêhm nakî ez fêhm dikim. Divê tu vê ferq bikî.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim, min tişt nedikir.

VLADIMIR: Dibe ku te tiştê nedikir. Lê yek jî rewş heye, rewşek heye, ger canê mirovî bi qîmet be. Dev jê berde, em êdî vê bihêlin. Ev e tu bi paş ve vegeriyayî, ez jî ji ber vê dilşa me.

ESTRAGON: Deh kes bûn.

VLADIMIR: Divê tu jî ji dil şa bî. Mikur were.

ESTRAGON: Ji ber çi dilşa?

VLADIMIR: Ji ber ku te ez dîsan dîtim.

ESTRAGON: Ew ji bo çi?

VLADIMIR: De bibêje, ne rast be jî dîsan bibêje.

ESTRAGON: Divê ez çi bibêjim?

VLADIMIR: Bibêje, ez dilşa me.

ESTRAGON: Ez dilşa me.

VLADIMIR: Ez jî.

ESTRAGON: Ez jî.

68

VLADIMIR (Dilê wî maye): Ger wilo be ji bo çi tu her tim vedigerî vir?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Lê ez dizanim. Ji ber ku tu nikanî xwe biparêzî. Ger ez li ba te bûma, min nedihîşt tu lêdanê bixwî.

ESTRAGON: Tu nikanîbû bibûya asteng.

VLADIMIR: Çima?

ESTRAGON: Ew deh kes bûn.

VLADIMIR: Yanî, ez ê ji rewşa ku te ê lêdan bixwara re bibûma asteng.

ESTRAGON: Min tiştê nedikir ku.

VLADIMIR: Wê çaxê ji bo çi wan li te dan?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Na, ev e tu dibînî, Gogo, hin tiştên ku tu fêhm nakî ez fêhm dikim. Divê tu vê ferq bikî.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim, min tişt nedikir.

VLADIMIR: Dibe ku te tiştê nedikir. Lê yek jî rewş heye, rewşek heye, ger canê mirovî bi qîmet be. Dev jê berde, em êdî vê bihêlin. Ev e tu bi paş ve vegeyayî, ez jî ji ber vê dilşa me.

ESTRAGON: Deh kes bûn.

VLADIMIR: Divê tu jî ji dil şa bî. Mikur were.

ESTRAGON: Ji ber çi dilşa?

VLADIMIR: Ji ber ku te ez dîsan dîtim.

ESTRAGON: Ew ji bo çi?

VLADIMIR: De bibêje, ne rast be jî dîsan bibêje.

ESTRAGON: Divê ez çi bibêjim?

VLADIMIR: Bibêje, ez dilşa me.

ESTRAGON: Ez dilşa me.

VLADIMIR: Ez jî.

ESTRAGON: Ez jî.

68

VLADIMIR: Em dilşa ne.

ESTRAGON: Em dilşa ne. (Bêdengî.) Niha, li gorî ku em dilşa ne, divê em çi bikin?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Raste.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ji do de li vir guhertin bûne.

ESTRAGON: Ger neyê?

VLADIMIR (demekê têngahîje, paşê): Em ê bifikirin. (Demek.)

Ez ji te re dibêjim ku ji do de li vir guhertin çêbûne.

ESTRAGON: Ji her tiştî tişteke tê.

VLADIMIR: Li darê binêre.

ESTRAGON: Mirov du caran pê li eynî gûyî nake.

VLADIMIR: Li darê binêre, lê binêre.

(Estragon li darê dinêre.)

ESTRAGON: Ma do jî ev dar ne li vir bû?

VLADIMIR: Li vir bû. Tê bîra min ha? Me ê çi xweşik xwe bi dar ve bikira. (Difikire.) Erê, wilo. (Kîteyan ji hev vediqetîne.) Me-ê-çi-xwe-şik-xwe- bi-dar-vebi-ki-ra.

Lê te nexwest. Ma nayê bîra te?



ESTRAGON: Te ew di xewna xwe de dîtiye.

VLADIMIR: Tu çawan dikanî evqasî zû ji bîr bikî?

ESTRAGON: Ez wilo me. An ez taviê ji bîr dikim, an jî ez qet ji bîr nakim.

VLADIMIR: Baş e, ma te Pozzo û Lucky jî ji bîr kirine?

ESTRAGON: Ew kî ne?

VLADIMIR: Her tiş ji bîr kiriye.

ESTRAGON: Bi tenê yekî har ku pehîn li min xistiye, tê bîra min.

VLADIMIR: Ew ê han Lucky bû.

ESTRAGON: Tê bîra min. Lê baş nayê bîra min bê kengî  
69

VLADIMIR: Em dilşa ne.

ESTRAGON: Em dilşa ne. (Bêdengî.) Niha, li gorî ku em dilşa ne, divê em çî bikin?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON Raste.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ji do de li vir guhertin bûne.

ESTRAGON: Ger neyê?

VLADIMIR (demekê têngihîje, paşê): Em ê bifikirin. (Demek.)  
Ez ji te re dibêjim ku ji do de li vir guhertin  
çêbûne.

ESTRAGON: Ji her tiştî tişteke tê.

VLADIMIR: Li darê binêre.

ESTRAGON: Mirov du caran pê li eynî gûyî nake.

VLADIMIR: Li darê binêre, lê binêre.

(Estragon li darê dinêre.)

ESTRAGON: Ma do jî ev dar ne li vir bû?

VLADIMIR: Li vir bû. Tê bîra min ha? Me ê çî xweşik xwe bi dar ve bikira. (Difikire.) Erê, wilo. (Kîteyan ji hev vediqetîne.) Me-ê-çi-xwe-şik-xwe- bi-dar-vebi-ki-ra. Lê te nexwest. Ma nayê bîra te?

ESTRAGON: Te ew di xewna xwe de dîtiye.

VLADIMIR: Tu çawan dikanî evqasî zû ji bîr bikî?

ESTRAGON: Ez wilo me. An ez tavilê ji bîr dikim, an jî ez qet ji bîr nakim.

VLADIMIR: Baş e, ma te Pozzo û Lucky jî ji bîr kirine?

ESTRAGON: Ew kî ne?

VLADIMIR: Her tiş ji bîr kiriye.

ESTRAGON: Bi tenê yekî har ku pehîn li min xistiye, tê bîra min.

VLADIMIR: Ew ê han Lucky bû.

ESTRAGON: Tê bîra min. Lê baş nayê bîra min bê kengî  
69  
bû.

VLADIMIR: Baş e, yê din jî tê bîra te?

ESTRAGON: Wî hestî da min.

VLADIMIR: Ew jî Pozzo bû.

ESTRAGON: Ma ev hemû do bûn?

VLADIMIR: Ji xwe, ma wê kengî bibe?

ESTRAGON: Li vir?

VLADIMIR: Erê! Ma tu vir nas dikî?

ESTRAGON (bi carekê ve hêrs dibe): Nas dikim? Çi ye yê ku ez ê nas bikim? Ez ê ji bo çî nas bikim? Ji vê jiyana xwe ya bêkêr ku ez li dû xwe dikişkişînim pê

ve ez tiştêkî nas nakim ku! Tu jî rabûyî û dixwazî  
ez detayan bibînim. (Çavêtt xwe li dora xwe digerîne.)

Li vê pîsiyê binêre! Ez ji vir xelas nebûm!

VLADIMIR: Bêhna xwe fireh bike, bêhna xwe fireh bike.

ESTRAGON: Jehr di nava dîmenan de be! Tu ji min re qala  
dinya binerdê bike!

VLADIMIR: Tu ji min re nebêje ku ev der dişibe Vacluseyê!  
Ji ber ku di navbera wan de ferqeke mezin heye.

ESTRAGON: Vacluse? Ew ji ku derket?

VLADIMIR: Ma tu li Vacluseyê nejiyayî?

ESTRAGON: Çi têkiliya wê pê re heye. Ez di jiyana xwe de  
neçûme Vacluseyê. Jiyan min a bêmane û pîs  
her li vir debas bûye. Li vir, li ser vî sergoyê gû!

VLADIMIR: Çawan çêdibe, em li Vacluseyê bi hev re bûn.  
Li Roussillonê, li rezê yekî bi navê Bonnelly em  
beşdarî maseran jî bûn.

ESTRAGON: (hê sakîntir): Çêdibe. Dêmek min baş bala  
xwe nedayê.

VLADIMIR: Ew hîç nabe, ji ber ku li wir her tişt sor î kurr  
bû!

70

bû.

VLADIMIR: Baş e, yê din jî tê bîra te?

ESTRAGON: Wî hestî da min.

VLADIMIR: Ew jî Pozzo bû.

ESTRAGON: Ma ev hemû do bûn?

VLADIMIR: Ji xwe, ma wê kengî bibe?

ESTRAGON: Li vir?

VLADIMIR: Erê! Ma tu vir nas dikî?

ESTRAGON (bi carekê ve hêrs dibe): Nas dikim? Çi ye yê ku ez ê nas bikim? Ez ê ji bo çi nas bikim? Ji vê jiyana xwe ya bêkêr ku ez li dû xwe dikişkişînim pê ve ez tiştê nas nakim ku! Tu jî rabûyî û dixwazî ez detayan bibînim. (Çavêtt xwe li dora xwe digerîne.)  
Li vê pîsiyê binêre! Ez ji vir xelas nebûm!

VLADIMIR: Bêhna xwe fireh bike, bêhna xwe fireh bike.

ESTRAGON: Jehr di nava dîmenan de be! Tu ji min re qala dinya binerdê bike!

VLADIMIR: Tu ji min re nebêje ku ev der dişibe Vacluseyê!  
Ji ber ku di navbera wan de ferqeke mezin heye.

ESTRAGON: Vacluse? Ew ji ku derket?

VLADIMIR: Ma tu li Vacluseyê nejiyayî?

ESTRAGON: Çi têkiliya wê pê re heye. Ez di jiyana xwe de neçûme Vacluseyê. Jiyana min a bêmane û pîs her li vir debas bûye. Li vir, li ser vî sergoyê gû!

VLADIMIR: Çawan çêdibe, em li Vacluseyê bi hev re bûn.  
Li Roussillonê, li rezê yekî bi navê Bonnelly em beşdarî maseran jî bûn.

ESTRAGON: (hê sakîntir): Çêdibe. Dêmek min baş bala xwe nedayê.

VLADIMIR: Ew hîç nabe, ji ber ku li wir her tişt sor î kurr bû!

70

ESTRAGON: Min bala xwe nedayê, ma çênabe!  
(Bêdengî. VLADIMIR bêhna xwe kûr kûr digire û berdide.)

VLADIMIR: Jiyana bi te re pir zehmet e, Gogo.

ESTRAGON: Ger em ji hev veqetin wê baş bibe.

VLADIMIR: Tu her tim eynî tiştî dibêjî. Lê her carê jî tu bi paş ve vedigerî.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ya baş ew e mîna ku wî kiriye, ez jî xwe bikujim.

VLADIMIR: Ew kî ye? (Demek.) Ew kî ye?

ESTRAGON: Mîna bi milyonan yên ku xwe dikujin.

VLADIMIR: (mîna bi xttab bipeyive): Her kes, biçûk an mezin sêpiya xwe hildigire. (Bêhna xwe berdide.)

Di dema niha ya biçûk û kurtedema paşê.

ESTRAGON: Em nikanin bêdeng bimînin, balo di vê libendemayinê de em bipeyivin, lê bê ku em wilo xwe winda bikin.

VLADIMIR: Çêdibe. Ji peyvê bêtir çî li ba me heye.

ESTRAGON: Ji bo ku em nefikirin.

VLADIMIR: Qisûra me heye.

ESTRAGON: Ji bo ku em nebihîzin.

VLADIMIR: Sebeb hene.

ESTRAGON: Dengê hemû miriyan.

VLADIMIR: Mîna dengê baskan.

ESTRAGON: Mîna dengê pelan.

VLADIMIR: Qûm.

ESTRAGON: Pel.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Hemû bi carekê ve dipeyivin.

ESTRAGON: Her yek ji xwe re.

(Bêdengî.)

71

ESTRAGON: Min bala xwe nedayê, ma çênabe!

(Bêdengî. VLADIMIR bêhna xwe kûr kûr digire

û berdide.)

VLADIMIR: Jiyana bi te re pir zehmet e, Gogo.

ESTRAGON: Ger em ji hev veqetin wê baş bibe.

VLADIMIR: Tu her tim eynî tiştî dibêjî. Lê her carê jî tu bi

paş ve vedigerî.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ya baş ew e mîna ku wî kiriye, ez jî xwe bikujim.

VLADIMIR: Ew kî ye? (Demek.) Ew kî ye?

ESTRAGON: Mîna bi milyonan yên ku xwe dikujin.

VLADIMIR: (mîna bi xttab bipeyive): Her kes, biçûk an

mezin sêpiya xwe hildigire. (Bêhna xwe berdide.)

Di dema niha ya biçûk û kurtedema paşê.

ESTRAGON: Em nikanin bêdeng bimînin, balo di vê libendemayinê

de em bipeyivin, lê bê ku em wilo xwe

winda bikin.

VLADIMIR: Çêdibe. Ji peyvê bêtir çî li ba me heye.

ESTRAGON: Ji bo ku em nefikirin.

VLADIMIR: Qisûra me heye.

ESTRAGON: Ji bo ku em nebihîzin.

VLADIMIR: Sebeb hene.

ESTRAGON: Dengê hemû miriyan.

VLADIMIR: Mîna dengê baskan.

ESTRAGON: Mîna dengê pelan.

VLADIMIR: Qûm.

ESTRAGON: Pel.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Hemû bi carekê ve dipeyivin.

ESTRAGON: Her yek ji xwe re.

(Bêdengî.)

71

VLADIMIR: Ya rastî ew dikin piste pist. \*-iJx.>?< ^ < ?.!::

ESTRAGON: Di ber xwe de dipeyivin.

VLADIMIR: Dixuşxuşin. \*' i)

ESTRAGON: Di ber xwe de dipeyivin:

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Çi dibêjin?

ESTRAGON: Behsa jiyana xwe dikin.

VLADIMIR: Mîna jiyana ku ew jiyane têr neke.

ESTRAGON: Têr nake ku!

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Tu dibêjî qey dengê mû ye.

ESTRAGON: Pel.

VLADIMIR: Xwelî.

ESTRAGON: Pel.

(Bêdengiyeke dirêj.)

VLADIMIR: Tişteki bibêje.

ESTRAGON: Ez lê digirim.

(Bêdengiyeke dirêj.)

VLADIMIR: (aciziyê ew girtiye): Hema tişteki bibêje tu çi dibêjî bibêje!

ESTRAGON: Tu niha çi dikî?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

(Bêdengî.)

VLADIMIR:Çizehmete!

ESTRAGON: Stranekê bibêje!

VLADIMIR: Na, çênabe. (Digere.) Wê çaxê em ji serî ve dest pê bikin.

ESTRAGON: Herhal wê ne pir zehmet be, tamam.

VLADIMIR: Tiştê zehmet destpêk e.

ESTRAGON: Hema ji tişteki dikare dest pê bibe.

VLADIMIR:Erê, lê divê biryar were dayin.

72

VLADIMIR: Ya rastî ew dikin piste pist. \*-iJx.>?< ^ < ?.!::

ESTRAGON: Di ber xwe de dipeyivin.

VLADIMIR: Dixuşxuşin. \*' i)

ESTRAGON: Di ber xwe de dipeyivin:

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Çi dibêjin?

ESTRAGON: Behsa jiyana xwe dikin.

VLADIMIR: Mîna jiyana ku ew jiyane têr neke.

ESTRAGON: Têr nake ku!

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Tu dibêjî qey dengê mû ye.

ESTRAGON: Pel.

VLADIMIR: Xwelî.

ESTRAGON: Pel.

(Bêdengiyeyeke dirêj.)

VLADIMIR: Tişteki bibêje.

ESTRAGON: Ez lê digirim.

(Bêdengiyeyeke dirêj.)



VLADIMIR: (aciziyê ew girtiye): Hema tiştêkî bibêje tu çi dibêjî bibêje!

ESTRAGON: Tu niha çi dikî?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

(Bêdengî.)

VLADIMIR:Çizehmete!

ESTRAGON: Stranekê bibêje!

VLADIMIR: Na, çênabe. (Digere.) Wê çaxê em ji serî ve dest pê bikin.

ESTRAGON: Herhal wê ne pir zehmet be, tamam.

VLADIMIR: Tiştê zehmet destpêk e.

ESTRAGON: Hema ji tiştêkî dikare dest pê bibe.

VLADIMIR:Erê, lê divê biryar were dayin.

72

ESTRAGON: rast e.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Alîkariya min bike!

ESTRAGON: Ez lê digirim.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Gava mirov digere, mirov dangan dibihîze.

ESTRAGONRaste.

VLADIMIR: Wê çaxê jî mirov nabîne.

ESTRAGON: Pir rast e.

VLADIMIR: Nafikire.

ESTRAGON: Dîsan jî difikire.

VLADIMIR: Na, ew bêîmkan e.

ESTRAGON: Baş e, em tiştên berevajiyên hev bibêjin.

VLADIMIR: Bêîmkan e. ESTRAGON: Çima nebe?  
VLADIMIR: Êdî tu tehlûkeya me ya fikirandinê nemaye.  
ESTRAGON: Wê çaxê ji bo çi em gazina dikin?  
VLADIMIR: Fikirandin ne ya herî xerab e.  
ESTRAGON: Bêşik, bêşik, lê wilo bûye.  
VLADIMIR: Wilo bûye, ev çi ye?  
ESTRAGON: Baş e, em pirsan ji hev bipirsin.  
VLADIMIR: Tu dixwazî bi çêbû, çi bibêjî?  
ESTRAGON: Çêbû, pirsek hate pirsîn û qediya jî.  
VLADIMIR: Rast e yaho.  
ESTRAGON: Baş e, tu ji fikira mîna ku em dilşa ne re çi dibêjî?  
VLADIMIR: Ya xerab fikirandin e.  
ESTRAGON: Ma tiştêkî wilo qet hatiye serê me?  
VLADIMIR: Ev termên han hemû ji ku tên?  
ESTRAGON: Ev skeletên han.  
VLADIMIR: Wilo.  
ESTRAGON: Tu ê çi bikî.  
73  
ESTRAGON: rast e.  
(Bêdengî.)  
VLADIMIR: Alîkariya min bike!  
ESTRAGON: Ez lê digirim.  
(Bêdengî.)  
VLADIMIR: Gava mirov digere, mirov dangan dibihîze.  
ESTRAGON: Raste.  
VLADIMIR: Wê çaxê jî mirov nabîne.  
ESTRAGON: Pir rast e.  
VLADIMIR: Nafikire.

ESTRAGON: Dîsan jî difikire.

VLADIMIR: Na, ew bêîmkan e.

ESTRAGON: Baş e, em tiştên berevajiyên hev bibêjin.

VLADIMIR: Bêîmkan e. ESTRAGON: Çima nebe?

VLADIMIR: Êdî tu tehlûkeya me ya fikirandinê nemaye.

ESTRAGON: Wê çaxê ji bo çi em gazina dîkin?

VLADIMIR: Fikirandin ne ya herî xerab e.

ESTRAGON: Bêşik, bêşik, lê wilo bûye.

VLADIMIR: Wilo bûye, ev çi ye?

ESTRAGON: Baş e, em pirsan ji hev bipirsîn.

VLADIMIR: Tu dixwazî bi çêbû, çi bibêjî?

ESTRAGON: Çêbû, pîrsek hate pîrsîn û qediya jî.

VLADIMIR: Rast e yaho.

ESTRAGON: Baş e, tu ji fikira mîna ku em dilşa ne re çi dibêjî?

VLADIMIR: Ya xerab fikirandin e.

ESTRAGON: Ma tiştêkî wilo qet hatiye serê me?

VLADIMIR: Ev termên han hemû ji ku tên?

ESTRAGON: Ev skeletên han.

VLADIMIR: Wilo.

ESTRAGON: Tu ê çi bikî.

73

VLADIMIR: Em jî hebekî fikirîne, yanî.

ESTRAGON: Di herî destpêkê de.

VLADIMIR: Li her derê bi koman term in.

ESTRAGON: Nenihere û hew.

VLADIMIR: Çavên min diçin ser. ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Tu çi dikî bike.

ESTRAGON: Libê?

VLADIMIR: Ez çî bikim bikim, çênabe.

ESTRAGON: Tiştê ku wê bête kirin biryareke ji bin dayine  
û vegeza xwezayê ye.

VLADIMIR: Me ew jî ceriband.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Oh, bêşik ya xerab ne ev e.

ESTRAGON: Ew çî ye?

VLADIMIR: Fikirandin.

ESTRAGON: Bêşik.

VLADIMIR: Lê, nebe jî dibe.

ESTRAGON: Tu ê çî bikî?

VLADIMIR: Ez dizanim, ez dizanim.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ji bo destpêkê qet ne xerab bû.

VLADIMIR: Erê, lê niha divê tişteki din were dîtin.

ESTRAGON: Wek çî?

VLADIMIR: Wekçi?

ESTRAGON: Wek çî?

(Difikirin.)

VLADIMIR: Min berî niha çî gotibû? Em dikanin ji wê dest  
pê bikin.

ESTRAGON: Kengî?

VLADIMIR: Di herî destpêkê de.

ESTRAGON: Di destpêka çî de?

74

VLADIMIR: Em jî hebekî fikirîne, yanî.

ESTRAGON: Di herî destpêkê de.

VLADIMIR: Li her derê bi koman term in.

ESTRAGON: Neni hêre û hew.

VLADIMIR: Çavên min diçin ser. ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Tu çî dikî bike.

ESTRAGON: Libê?

VLADIMIR: Ez çî bikim bikim, çênabe.

ESTRAGON: Tiştê ku wê bête kirin biryareke ji bin dayine  
û vegeza xwezayê ye.

VLADIMIR: Me ew jî ceriband.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Oh, bêşik ya xerab ne ev e.

ESTRAGON: Ew çî ye?

VLADIMIR: Fikirandin.

ESTRAGON: Bêşik.

VLADIMIR: Lê, nebe jî dibe.

ESTRAGON: Tu ê çî bikî?

VLADIMIR: Ez dizanim, ez dizanim.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ji bo destpêkê qet ne xerab bû.

VLADIMIR: Erê, lê niha divê tiştêkî din were dîtin.

ESTRAGON: Wek çî?

VLADIMIR: Wek çî?

ESTRAGON: Wek çî?

(Difikirin.)

VLADIMIR: Min berî niha çî gotibû? Em dikanin ji wê dest  
pê bikin.

ESTRAGON: Kengî?

VLADIMIR: Di herî destpêkê de.

ESTRAGON: Di destpêka çî de?

VLADIMIR: Vê êvarê. Min çîk gotibû... çîk gotibû...

ESTRAGON: Of lo, tu çiqas pir tiştan ji min dixwazî.

VLADIMIR: Raweste... me hevdu hemêz kir... em razî bûn... razî... li gorî ku em niha razî ne em çî dîkin... em radiwestin... heydê... tê... li gorî ku em niha razî ne... em radiwestin... li ser zimanê min e... tamam! Dar!

ESTRAGON: Dar?

VLADIMIR: Ma nayê bîra te?

ESTRAGON: Ez westiyayî me.

VLADIMIR: Li darê binêre.

(Estragon li darê dinêre.)

ESTRAGON: Ez tişteki nabînim.

VLADIMIR: Do êvarî mîna skeleteke ripîreş bû! Lê niha bi pelan ve nixumandiye.

ESTRAGON: Bi pelan?

VLADIMIR: Di şevê de!

ESTRAGON: Herhal em di biharê de ne.

VLADIMIR: Di şevê de!

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim ku em do êvarî ne li vir bûn, tu bawer nakî. Te ew di xewna xwe de dîtiye.

VLADIMIR: Baş e, wê çaxê, em şeva çûyî li ku bûn?

ESTRAGON: Ez nizanim. Em li cihekî din bûn. Li devereke din. Ji cihên vala bêtir çî heye.

VLADIMIR (ji xwe êmin): Temam. Em do êvarî ne li vir bûn. Wê çaxê bibêje, me do êvarî çî kir?

ESTRAGON: Me çî kir?

VLADIMIR: Bîne bîra xwe.

ESTRAGON: Himm... herhal em peyvîn.

VLADIMIR: (xwe digire): Di derheqa çi de?

ESTRAGON: Çîk... ji vir de û wê de, vala, ji serî û binî.

75

VLADIMIR: Vê êvarê. Min çîk gotibû... çîk gotibû...

ESTRAGON: Of lo, tu çiqas pir tiştan ji min dixwazî.

VLADIMIR: Raweste... me hevdu hemêz kir... em razî

bûn... razî... li gorî ku em niha razî ne em çi dikin...

em radiwestin... heydê... tê... li gorî ku em

niha razî ne... em radiwestin... li ser zimanê min

e... tamam! Dar!

ESTRAGON: Dar?

VLADIMIR: Ma nayê bîra te?

ESTRAGON: Ez westiyayî me.

VLADIMIR: Li darê binêre.

(Estragon li darê dinêre.)

ESTRAGON: Ez tişteki nabînim.

VLADIMIR: Do êvarî mîna skeleteke ripîreş bû! Lê niha bi

pelan ve nixumandiye.

ESTRAGON: Bi pelan?

VLADIMIR: Di şevê de!

ESTRAGON: Herhal em di biharê de ne.

VLADIMIR: Di şevê de!

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim ku em do êvarî ne li vir

bûn, tu bawer nakî. Te ew di xewna xwe de dîtiye.

VLADIMIR: Baş e, wê çaxê, em şeva çûyî li ku bûn?

ESTRAGON: Ez nizanim. Em li cihekî din bûn. Li devereke

din. Ji cihên vala bêtir çi heye.

VLADIMIR (ji xwe êmin): Temam. Em do êvarî ne li vir bûn. Wê çaxê bibêje, me do êvarî çi kir?

ESTRAGON: Me çi kir?

VLADIMIR: Bîne bîra xwe.

ESTRAGON: Himm... herhal em peyivîn.

VLADIMIR: (xwe digire): Di derheqa çi de?

ESTRAGON: Çêk... ji vir de û wê de, vala, ji serî û binî.

75

(Baweriya xwe bi xwe qezenc kiriye) Temam, tê bîra min, em ji vir de û wê de, ji serî û binî peyivîn. Ev pêncî sal in em eynî tiştî dîkin.

VLADIMIR: Ma tu bûyer, an jî tişteki ku bûye, nayê bîra te?

ESTRAGON (betilî): Bela xwe di min nede, Didi.

VLADIMIR: Roj? Heyv? Nayên bîra te?

ESTRAGON: Hebe tune be ew ê mîna her tim li wir bin.

VLADIMIR: Tişteki ji adetê der li çavê te neketibe?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Lê Pozzo? Lê Lucky?

ESTRAGON: Pozzo kî ye?

VLADIMIR: Hestî.

ESTRAGON: Weke şûr bûn.

VLADIMIR: Pozzo ew dane te.

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Baş e, lê pehîn?

ESTRAGON: Te got pehîn? Rast e, yekî pehîn li min xist.

VLADIMIR: Yê ku pehîn li te xist Lucky bû.



ESTRAGON: Ma ev hemû do bûne?

VLADIMIR: Ka ez li çîmên te binihêrim.

ESTRAGON: Li kîjanî?

VLADIMIR: Li herduwan jî. Delingê xwe lê wergerîne.

(Estragon li ser lingekî lingê xwe dirêjê VLADIMIR

dike, dike bikeve. VLADIMIR bi çîmê wî

digire. Estragon diheje.) Delingê xwe lê wergerîne.

ESTRAGON: (Diheje): Ez nikanim.

(VLADIMIR deîngê Estragon lê werdigerîne. Li

lingê wîdinihêre. Estragon dike bikeve.)

VLADIMIR: Yê din dirêj bike. (Estragon eynî lingê dirêj dike.)

Ez ji te re dibêjim yê din dirêj bike! (Bi çîmê

din eynî hereketan dike.) Ev e birîn li vir e, kul bû-

76

(Baweriya xwe bi xwe qezenc kiriye) Temam, tê

bîra min, em ji vir de û wê de, ji serî û binî peyivîn.

Ev pêncî sal in em eynî tiştî dikin.

VLADIMIR: Ma tu bûyer, an jî tişteki ku bûye, nayê bîra

te?

ESTRAGON (betilî): Bela xwe di min nede, Didi.

VLADIMIR: Roj? Heyv? Nayên bîra te?

ESTRAGON: Hebe tune be ew ê mîna her tim li wir bin.

VLADIMIR: Tişteki ji adetê der li çavê te neketibe?

ESTRAGON: Na.

VLADIMIR: Lê Pozzo? Lê Lucky?

ESTRAGON: Pozzo kî ye?

VLADIMIR: Hestî.

ESTRAGON: Weke şûr bûn.

VLADIMIR: Pozzo ew dane te.

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Baş e, lê pehîn?

ESTRAGON: Te got pehîn? Rast e, yekî pehîn li min xist.

VLADIMIR: Yê ku pehîn li te xist Lucky bû.

ESTRAGON: Ma ev hemû do bûne?

VLADIMIR: Ka ez li çîmên te binihêrim.

ESTRAGON: Li kîjanî?

VLADIMIR: Li herduwan jî. Delingê xwe lê wergerîne.

(Estragon li ser lingekî lingê xwe dirêjê VLADIMIR

dike, dike bikeve. VLADIMIR bi çîmê wî

digire. Estragon diheje.) Delingê xwe lê wergerîne.

ESTRAGON: (Diheje): Ez nikanim.

(VLADIMIR deîngê Estragon lê werdigerîne. Li

lingê wîdinihêre. Estragon dike bikeve.)

VLADIMIR: Yê din dirêj bike. (Estragon eynî lingê dirêj dike.)

Ez ji te re dibêjim yê din dirêj bike! (Bi çîmê

din eynî hereketan dike.) Ev e birîn li vir e, kul bû-

76

ye.

ESTRAGON: Wê niha çî bibe?

VLADIMIR: Solên te li ku ne?

ESTRAGON: Herhal min ê ew avêtibin.

VLADIMIR: Kengî?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Ji bo çî?

ESTRAGON: Nayê bîra min.

VLADIMIR: Na, yanî ez dibêjim te ji bo çî ew avêtin.

ESTRAGON: Wan ez diêşandim.

VLADIMIR (Solan nîşan dide): Ev e, sol li vir in. (Estragon li soîan dinihêre.) Ew li cihê do ne.

(Estragon ber bi solan ve diçe, daqûl dibe, ji nêzîk ve li solan dinihêre. )

ESTRAGON: Ev ne yê min in.

VLADIMIR: Ev ne yê te ne?

ESTRAGON: Yê min reş bûn. Ev zer in.

VLADIMIR: Ma tu êmin î ku yê te reş bûn?

ESTRAGON: Yanî gewr bûn.

VLADIMIR: Baş e ma ev zer in? Ka nîşan bide.

ESTRAGON: Yanî bi ser şîn ve ne.

VLADIMIR: Ka nîşan bide. (Estragon solan dide wt. VLADIMIR li solan dinihere û wan bi hêrs divirvirtne.

) Êdî ev zêde ye!

ESTRAGON: Tu dibînî, ev hemû...

VLADIMIR: Ez fêhm dikim. Erê, tiştên ku dibin ez fêhm dikim.

ESTRAGON: Ev hemû...

VLADIMIR: Pir basîd e. Yek hat, ji berdêla yê te yê xwe danîn.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku yê wî ji wî re nedibûn. Wî yê te bi-  
77

ye.

ESTRAGON: Wê niha çî bibe?

VLADIMIR: Solên te li ku ne?

ESTRAGON: Herhal min ê ew avêtibin.

VLADIMIR: Kengî?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Ji bo çi?

ESTRAGON: Nayê bîra min.

VLADIMIR: Na, yanî ez dibêjim te ji bo çi ew avêtin.

ESTRAGON: Wan ez diêşandim.

VLADIMIR (Solan nîşan dide): Ev e, sol li vir in. (Estragon li soîan dinihêre.) Ew li cihê do ne.

(Estragon ber bi solan ve diçe, daqûl dibe, ji nêzîk ve li solan dinihêre. )

ESTRAGON: Ev ne yê min in.

VLADIMIR: Ev ne yê te ne?

ESTRAGON: Yê min reş bûn. Ev zer in.

VLADIMIR: Ma tu êmin î ku yê te reş bûn?

ESTRAGON: Yanî gewr bûn.

VLADIMIR: Baş e ma ev zer in? Ka nîşan bide.

ESTRAGON: Yanî bi ser şîn ve ne.

VLADIMIR: Ka nîşan bide. (Estragon solan dide wt. VLADIMIR li solan dinihere û wan bi hêrs divirvirtne.

) Êdî ev zêde ye!

ESTRAGON: Tu dibînî, ev hemû...

VLADIMIR: Ez fêhm dikim. Erê, tiştên ku dibin ez fêhm dikim.

ESTRAGON: Ev hemû...

VLADIMIR: Pir basîd e. Yek hat, ji berdêla yê te yê xwe danîn.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Ji ber ku yê wî ji wî re nedibûn. Wî yê te bi-

77

nn. ESTRAGON: Lê yê min pir biçûk bûn.

VLADIMIR: Ew ji te re biçûk bûn, ne ji wî re.  
ESTRAGON: Ez westiya me. (Demek.) Em ji vir herin.  
VLADIMIR: Em nikanin herin.  
ESTRAGON: Çima?  
VLADIMIR: Em li benda Godot ne.  
ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Baş e em ê çi bikin.  
VLADIMIR: Tişteki ku em bikin tune. *tuneye.*  
ESTRAGON: Ez êdî debar nakim.  
VLADIMIR: Ma tu tirpekê naxwazi?  
ESTRAGON: Tişteki din tune?  
VLADIMIR: Tirp û şêlim heye.  
ESTRAGON: Ma gêzer jî tune?  
VLADIMIR: Na. Ew jî tune.  
ESTRAGON: Wê çaxê tirpekê bide min. (VLADIMIR li bêrikên xwe digere, ji bilî şêliman tişteki nabîne, dawt dawî tirpekê dibîne û dide Estragon. Estragon tirpê kontrol dike, bêhn dike.) Ev tirp reş e!  
VLADIMIR: Ev e, tirp e.  
ESTRAGON: Ez ji tirpa reş hez nakim, ez ji tirpa sor hez dikim!  
VLADIMIR: Wê çaxê ka bide min.  
(Estragon tirpê didiyê.)  
ESTRAGON: Ez ê herim li gêzeran bigerim.  
(Dîsan tevnaîve. )  
VLADIMIR: Êdî bi rastî ev maneya xwe winda dike.  
ESTRAGON: Hê ne hemûyî.  
(Bêdengî.)  
VLADIMIR: Te ew biceribanda.  
ESTRAGON: Min her tişt ceribandîye.

VLADIMIR: Ez solan dibêjim.

78

nn. ESTRAGON: Lê yên min pir biçûk bûn.

VLADIMIR: Ew ji te re biçûk bûn, ne ji wî re.

ESTRAGON: Ez westiya me. (Demek.) Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Baş e em ê çi bikin.

VLADIMIR: Tişteki ku em bikin tune.

ESTRAGON: Ez êdî debar nakim.

VLADIMIR: Ma tu tirpekê naxwazî?

ESTRAGON: Tişteki din tune?

VLADIMIR: Tirp û şêlim heye.

ESTRAGON: Ma gêzer jî tune?

VLADIMIR: Na. Ew jî tune.

ESTRAGON: Wê çaxê tirpekê bide min. (VLADIMIR li bêrikên xwe digere, ji bilî şêliman tişteki nabîne, dawt dawî tirpekê dibîne û dide Estragon. Estragon tirpê kontrol dike, bêhn dike.) Ev tirp reş e!

VLADIMIR: Ev e, tirp e.

ESTRAGON: Ez ji tirpa reş hez nakim, ez ji tirpa sor hez dikim!

VLADIMIR: Wê çaxê ka bide min.

(Estragon tirpê didiyê.)

ESTRAGON: Ez ê herim li gêzeran bigerim.

(Dîsan tevnaîve. )

VLADIMIR: Êdî bi rastî ev maneya xwe winda dike.

ESTRAGON: Hê ne hemûyî.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Te ew biceribanda.

ESTRAGON: Min her tişt ceribandîye.

VLADIMIR: Ez solan dibêjim.

78

ESTRAGON: Gelo wê ji min re bibin?

VLADIMIR: Wê wext derbas bike. (Estragon dudilt dibe.)

Bawer bike, wê guhertinek çêbibe.

ESTRAGON: Rehetiyek.

VLADIMIR: Şahiyek.

ESTRAGON: Rehetiyek.

VLADIMIR: Biceribîne.

ESTRAGON: Ma tu ê alîkarî bikî?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Gava em herdu bi hev re bin, mîna ku em ji heq derdikevin, ne wilo Didi, ji heq gelek tiştan?

VLADIMIR: Erê, erê, ji xwe. Heydê, em ê pêşî ya çepê biceribînin.

ESTRAGON: Em her tim tiştêkî dibînin, ne wilo Didi, ji bo ku em bidin xuyakirin ku em hene.

VLADIMIR: (Bêsebir e): Ji xwe, em sihêrbaz in. Lê em ji biryara xwe nequlupin. (Ji erdê radihîje solekê.)

Were, ka lingê te. (Estragon nêzîkî wî dibe, lingê xwe dirêj dike.) Yê din, beraz! (Estragon lingê

xwe yê din dirêj dike.) Hê bilindtir! (Laşê wan gihîştîye hev, mîna kuwê bikevin, di sehnê de digerin.

Dawiyê Vladimir bi ser dikeve û solê dixwe lingê

Estragon.) Ka biceribîne, bimeşe. (Estragon dimeşe.)

Çawa ye?

ESTRAGON: Ji lingên min re bûn.

VLADIMIR (Benekîji bêrîka xwe derdixe): Em qeytanan tê rakin.

ESTRAGON: (Pir bi heyecan e): Na, na, ez qeytanan naxwazim, ez qeytanan naxwazim!

VLADIMIR: Tu dînîtiyê dikî. Ka em ya din biceribînin. (Eynîhereket.) Çawa ye?

ESTRAGON Ev jî çêbû.

79

ESTRAGON: Gelo wê ji min re bibin?

VLADIMIR: Wê wext derbas bike. (Estragon dudilt dibe.)

Bawer bike, wê guhertinek çêbibe.

ESTRAGON: Rehetiyek.

VLADIMIR: Şahiyek.

ESTRAGON: Rehetiyek.

VLADIMIR: Biceribîne.

ESTRAGON: Ma tu ê alîkarî bikî?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Gava em herdu bi hev re bin, mîna ku em ji heq derdikevin, ne wilo Didi, ji heq gelek tiştan?

VLADIMIR: Erê, erê, ji xwe. Heydê, em ê pêşî ya çepê biceribînin.

ESTRAGON: Em her tim tiştêkî dibînin, ne wilo Didi, ji bo ku em bidin xuyakirin ku em hene.

VLADIMIR: (Bêsebir e): Ji xwe, em sihêrbaz in. Lê em ji biryara xwe nequlupin. (Ji erdê radihîje solekê.)

Were, ka lingê te. (Estragon nêzîkî wî dibe, lingê

xwe dirêj dike.) Yê din, beraz! (Estragon lingê

xwe yê din dirêj dike.) Hê bilindtir! (Laşê wan gihîştîye



hev, mîna kuwê bikevin, di sehnê de digerin.

Dawiyê Vladimir bi ser dikeve û solê dixê lingê

Estragon.) Ka biceribîne, bimeşe. (Estragon dimeşe.)

Çawa ye?

ESTRAGON: Ji lingên min re bûn.

VLADIMIR (Benekîji bêrîka xwe derdixê): Em qeytanan tê rakin.

ESTRAGON: (Pir bi heyecan e): Na, na, ez qeytanan naxwazim, ez qeytanan naxwazim!

VLADIMIR: Tu dînîtiyê dikî. Ka em ya din biceribînin. (Eynîhereket.)

Çawa ye?

ESTRAGON Ev jî çêbû.

79

VLADIMIR: Li lingên te naxin?

ESTRAGON (Bi zorê çend gavan davêje): Niha baş e.

VLADIMIR: Wê çaxê wan ji lingên xwe dernexe.

ESTRAGON: Pir mezin in.

VLADIMIR: Belkî rojek ji rojan gorên te jî çêbibin.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Ma tu wan dixî pê?

ESTRAGON: Me pir behsa solan kir.

VLADIMIR: Erê, lê...

ESTRAGON: Bes e! (Bêdengî.) Ger ez rûnê wê ne xerab e. (Çavên xwe ti cihê rûniştinê digêrîne, paşê diçe ii cihê ku ew di perdeya yekemîn de rûniştibû, rûdine. )

VLADIMIR: Tu do êvarî jî li wir rûniştibû. (Bêdengî.)

ESTRAGON: Ez bikanîbûma hinekî razama.

VLADIMIR: Tu do êvarî raza.

ESTRAGON: Ez ê biceribînim. (Serê wî di nava lingên wî de ye, dibe mîna gava ew di malzarokê de bû. )

VLADIMIR: Raweste. (Nêzîkî Estragon dibe, bi dengê bi-îind strana dibêje.)

L\*ee lee lee

ESTAGON (serê xwe radike): Ewqasî meqîre.

VLADIMIR (he nizimtir):

Lêê lêê lolo loo

Lêê lêê loo loo

Lêê lêê loo loo

Lee...

(Estragon radizê. Vladimir çakêtê xwe ji xwe dike

80

VLADIMIR: Li lingên te naxin?

ESTRAGON (Bi zorê çend gavan davêje): Niha baş e.

VLADIMIR: Wê çaxê wan ji lingên xwe dernexe.

ESTRAGON: Pir mezin in.

VLADIMIR: Belkî rojek ji rojan gorên te jî çêbibin.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Ma tu wan dixî pê?

ESTRAGON: Me pir behsa solan kir.

VLADIMIR:Erê,lê...

ESTRAGON: Bes e! (Bêdengî.) Ger ez rûnê wê ne xerab e. (Çavên xwe ti cihekî rûniştinê digerîne, paşê diçe ii cihê ku ew di perdeya yekemîn de rûniştibû, rûdine. )

VLADIMIR: Tu do êvarî jî li wir rûniştibû. (Bêdengî.)

ESTRAGON: Ez bikanîbûma hinekî razama.

VLADIMIR: Tu do êvarî raza.

ESTRAGON: Ez ê biceribînim. (Serê wî di nava lingên wî de ye, dibe mîna gava ew di malzarokê de bû. )

VLADIMIR: Raweste. (Nêzîkî Estragon dibe, bi dengê bi-îind strana dibêje.)

L\*ee lee lee

ESTAGON (serê xwe radike): Ewqasî meqîre.

VLADIMIR (he nizimtir):

Lêê lêê lolo loo

Lêê lêê loo loo

Lêê lêê loo loo

Lee...

(Estragon radizê. Vladimir çakêtê xwe ji xwe dike

80

û bi wîdadike, paşê ji boku germ bibe bi destan li iaşê xwe dixê û diçe û tê. Estragon ji xewê hoî dibe, radibe ser xwe û çend gavan davêje. Vîadimir ber bi wî ve baz dide, destên xwe lê digerîne.)

VLADIMIR: Na... na... binêr va ye ez li vir im... metirse...

ESTRAGON: Ax!

VLADIMIR: Na... na... derbas bû.

ESTRAGON: Ez wextî biketima.

VLADIMIR: Çû. Êdî lê nefikire.

ESTRAGON: Ez li ser öşteki me...

VLADIMIR: Na, na, tişteki nebêje. Were em bîskê bimeşin.

(Dikeve milê Estragon, wî di sehnê de digerîne.

Paşê Estragon naxwaze bimeşe.)

ESTRAGON: Bes e! Ez westiyam.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî em bi tenê li ser lingan rawestin  
û tiştêkînekin?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Tu çawan bixwazî. (Estragon berdide, diçe çakêtê  
xweji erdê radihêjê, diçe.)

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Vladimir dîsan di sehne de diçe û tê.)  
Ma tu nikanî rehet bisekinî?

VLADIMIR: Min sar e.

ESTRAGON: Em pir zû hatin.

VLADIMIR: Her tim gava dinya tarî dibe em tên.

ESTRAGON: Lê dinya tarî nabe.

VLADIMIR: Wê mîna do bi carekê ve tarî bibe.

ESTRAGON: Wê paşê jî bibe şev.

VLADIMIR: Em ê jî bikanibin herin.

81

û bi wîdadike, paşê ji boku germ bibe bi destan li  
iaşê xwe dixê û diçe û tê. Estragon ji xewê hoî dibe,  
radibe ser xwe û çend gavan davêje. Vîadimir  
ber bi wî ve baz dide, destên xwe lê digêrîne.)

VLADIMIR: Na... na... binêr va ye ez li vir im... metirse...

ESTRAGON: Ax!

VLADIMIR: Na... na... derbas bû.

ESTRAGON: Ez wextî biketima.

VLADIMIR: Çû. Êdî lê nefikire.

ESTRAGON: Ez li ser öşteki me...

VLADIMIR: Na, na, tişteki nebêje. Were em bîskê bimeşin.

(Dikeve milê Estragon, wî di sehnê de digerîne.

Paşê Estragon naxwaze bimeşe.)

ESTRAGON: Bes e! Ez westiyam.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî em bi tenê li ser lingan rawestin

û tiştekinêkin?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Tu çawan bixwazî. (Estragon berdide, diçe çakête xweji erdê radihêjê, diçe.)

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Vladimir dîsan di sehne de diçe û tê.)

Ma tu nikanî rehet bisekinî?

VLADIMIR: Min sar e.

ESTRAGON: Em pir zû hatin.

VLADIMIR: Her tim gava dinya tarî dibe em tên.

ESTRAGON: Lê dinya tarî nabe.

VLADIMIR: Wê mîna do bi carekê ve tarî bibe.

ESTRAGON: Wê paşê jî bibe şev.

VLADIMIR: Em ê jî bikanibin herin.

81

ESTRAGON: Wê paşê dîsan bibe roj. (Demek.) Divê em çi bikin, em çi bikin?

VLADIMIR (radiweste, bi hêrs): Tu ê dev ji van gazinan

berdî? Zirîna te sinirê min xerab dike.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR (Şewqeyê Lucky dibîne): Li vî binêre!

ESTRAGON: Di xweşiyê de bimîne.

VLADIMIR: Şewqê Lucky! (Nêzîkî wî dibe.) Ev saetek e ez li vir im, min çawan nedît! (Pir razîye.) Çi baş e!

ESTRAGON: Tu ê careke din min nebînî.

VLADIMIR: Dêmek min cih şaş nekiribû. Niha dilê me rehet bû. (Şewqeyê Lucky ji erdê radike, di çav re derbas dike, rast dike.) Demekê şewqeyekî baş bûye. (Şewqeyê xwe ji serê xwe dike, yê Lucky dixê serê xwe; Şewqeyê xwe jî dirêjî Estragon dike.) Bigire.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Vî bigire.

(Estragon şewqeyê Viadimir digire. Vîadimir bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Vladimir dide serê xwe, şewqeyê xwe dirêjî Vladimir dike. Vladimir şewqeyê Estragon digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê Vladimir di serê xwe de bi cih dike. Vladimir şewqeyê Lucky ji serê xwe dike û dirêjî Estragon dike û şewqeyê Estragon dide serê xwe, Estragon şewqeyê Lucky digire, Vladimir bi herdu destan şewqeyê Estragon di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Vladimir ji serê xwe dike û dirêjî Vladimir dike, di şûna wê de şewqeyê Lucky dide serê xwe. Vladimir şewqeyê xwe digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe

82

ESTRAGON: Wê paşê dîsan bibe roj. (Demek.) Divê em çi bikin, em çi bikin?

VLADIMIR (radiweste, bi hêrs): Tu ê dev ji van gazinan berdî? Zirîna te sinirê min xerab dike.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR (Şewqeyê Lucky dibîne): Li vî binêre!

ESTRAGON: Di xweşiyê de bimîne.

VLADIMIR: Şewqê Lucky! (Nêzîkî wî dibe.) Ev saetek e ez li vir im, min çawan nedît! (Pir razîye.) Çi baş e!

ESTRAGON: Tu ê careke din min nebînê.

VLADIMIR: Dêmek min cih şaş nekiribû. Niha dilê me rehet bû. (Şewqeyê Lucky ji erdê radike, di çav re derbas dike, rast dike.) Demekê şewqeyekî baş bûye. (Şewqeyê xwe ji serê xwe dike, yê Lucky dixê serê xwe; Şewqeyê xwe jî dirêjê Estragon dike.) Bigire.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Vî bigire.

(Estragon şewqeyê Viadimir digire. Vîadimir bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Vladimir dide serê xwe, şewqeyê xwe dirêjê Vladimir dike. Vladimir şewqeyê Estragon digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê Vladimir di serê xwe de bi cih dike. Vladimir şewqeyê Lucky ji serê xwe dike û dirêjê Estragon dike û şewqeyê Estragon dide serê xwe, Estragon şewqeyê Lucky digire, Vladimir bi herdu destan şewqeyê Estragon di serê xwe de bi cih dike.)

Estagon şewqeyê Vladimir ji serê xwe dike û dirêjî Vladimir dike, di şûna wê de şewqeyê Lucky dide serê xwe. Vladimir şewqeyê xwe digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe

82  
de bi cih dike. Vladimir şewqeyê Estragon ji serê xwe dike û dirêjî Estragon dike, şewqeyê xwe dide serê xwe. Estragon şewqeyê xwe digire. Vîadimir bi herdu destan şewqeyê xwe di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Lucky ji serê xwe dike û dirêjî Vladimir dike, dîsan şewqeyê xwe dide serê xwe. Vladimir şewqeyê Lucky digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê xwe di serê xwe de bi cih dike. Vladimir şewqeyê xwe derdixe û dirêjî Estragon dike, dîsan şewqeyê Lucky dide serê xwe. Estragon şewqeyê Vladimir digire. Vladimir bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Vladimir dirêjî Vladimir dike; Vladimri şewqeyê xwe digire û dîsan berepaş dirêjî Estragon dike; Estragon şewqe digire û dîsan dirêjî Viadimir dike; Vladimir şewqe digire û davêje. Wê ev hemû bi hereketêti jîtidar bibin.)

VLADIMIR: Ma li min hatiye?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Tu min çawan dibînî yaho?

(Serê xwe bi delalî ber bi çep û rastê ve dizîvirîtte, pozê mankenan dide.)

ESTRAGON: Ecêb e.



VLADIMIR: Ji ya her tim ne bêtir e, ne wilo?

ESTRAGON: Eynî ye.

VLADIMIR: Wê çaxê ez dikanim li xwe bikim. Yên min ez diêşandim. (Demek.) Ez çawan bêjim. (Demek.) Serê min dida xurandin.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî bi min re lîstikekê bilîzî?

ESTRAGON: Çi lîstik?

83

de bi cih dike. Vladimir şewqeyê Estragon ji serê xwe dike û dirêjî Estragon dike, şewqeyê xwe dide serê xwe. Estragon şewqeyê xwe digire. Vîadimir bi herdu destan şewqeyê xwe di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Lucky ji serê xwe dike û dirêjî Vladimir dike, dîsan şewqeyê xwe dide serê xwe. Vladimir şewqeyê Lucky digire. Estragon bi herdu destan şewqeyê xwe di serê xwe de bi cih dike. Vladimir şewqeyê xwe derdixe û dirêjî Estragon dike, dîsan şewqeyê Lucky dide serê xwe. Estragon şewqeyê Vladimir digire. Vladimir bi herdu destan şewqeyê Lucky di serê xwe de bi cih dike. Estragon şewqeyê Vladimir dirêjî Vladimir dike; Vladimri şewqeyê xwe digire û dîsan berepaş dirêjî Estragon dike; Estragon şewqe digire û dîsan dirêjî Viadimir dike; Vladimir şewqe digire û davêje. Wê ev hemû bi hereketêti jîtidar bibin.)

VLADIMIR: Ma li min hatiye?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Tu min çawan dibînî yaho?

(Serê xwe bi delalî ber bi çep û rastê ve dizîvirîtte,  
pozê mankenan dide.)

ESTRAGON: Ecêb e.

VLADIMIR: Ji ya her tim ne bêtir e, ne wilo?

ESTRAGON: Eynî ye.

VLADIMIR: Wê çaxê ez dikanim li xwe bikim. Yên min ez  
diêşandim. (Demek.) Ez çawan bêjim. (Demek.)

Serê min dida xurandin.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Ma tu dixwazî bi min re lîstikekê bilîzî?

ESTRAGON: Çi lîstik?

83

VLADIMIR: Ger tu bixwazî em dikanin Pozzo û Luckytiyê  
bileyizin.

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Ez bibim Lucky tu jî bibî Pozzo. (Pişta wî di  
bin barê wî de tewiyaye, zarî Luky dike. Estragon  
bi heyret li wî dinihêre.) Heydê, dest pê bike.

ESTRAGON: Divê ez çî bikim?

VLADIMIR: Ji min re xeberan bide!

ESTRAGON: Genî!

VLADIMIR: Hê xerabtir!

ESTRAGON: Çewalê gû! Bênamûs!

( Vladimir her wilo piştewiyayî diçe û tê.)

VLADIMIR: Ji min re bibêje bifikire.

ESTRAGON: Çawan?

VLADIMIR: Bifikire, beraz! bibêje.

ESTRAGON: Bifikire, beraz!

(Bêdengî)

VLADIMIR: Çênabe!

ESTRAGON: Bes e!

VLADIMIR: Ji min rê bibêje dans bike.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Dans bike, beraz! (Di cihê xwe de dizîvire,

xwar dibe. Estragon bi carekê ve derdikeve.) Ez

nikanim! (Serê xwe radike, dibîne ku Estragon ne

li wir e, bilind diqîre.) Gogo! (Bêdengî. Mîna ku

direve diçe û tê. Estragon bi carekê ve bi bêhnçikiyayî

tê, ber bi Vladimir ve direve. Çend gavan ji

hev bi dûr radiwestin.) Dêmek tu dawî dawî vegeriya!

ESTRAGON (Bêhna xwe dide û distîne): Nalet bi ser min

de bariya!

VLADIMIR: Tu çûbû ku? Min texmîn kir ku tu ê careke

84

VLADIMIR: Ger tu bixwazî em dikanin Pozzo û Luckytiyê

bileyizin.

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Ez bibim Lucky tu jî bibî Pozzo. (Pişta wî di

bin barê wî de tewiyaye, zarî Luky dike. Estragon

bi heyret li wî dinihêre.) Heydê, dest pê bike.

ESTRAGON: Divê ez çî bikim?

VLADIMIR: Ji min re xeberan bide!

ESTRAGON: Genî!

VLADIMIR: Hê xerabtir!

ESTRAGON: Çewalê gû! Bênamûs!

( Vladimir her wilo piştewiyayî diçe û tê.)

VLADIMIR: Ji min re bibêje bifikire.

ESTRAGON: Çawan?

VLADIMIR: Bifikire, beraz! bibêje.

ESTRAGON: Bifikire, beraz!

(Bêdengî)

VLADIMIR: Çênabe!

ESTRAGON: Bes e!

VLADIMIR: Ji min rê bibêje dans bike.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Dans bike, beraz! (Di cihê xwe de dizîvire, xwar dibe. Estragon bi carekê ve derdikeve.) Ez

nikanim! (Serê xwe radike, dibîne ku Estragon ne

li wir e, bilind diqîre.) Gogo! (Bêdengî. Mîna ku

direve diçe û tê. Estragon bi carekê ve bi bêhnçikiyayî

tê, ber bi Vladimir ve direve. Çend gavan ji

hev bi dûr radiwestin.) Dêmek tu dawî dawî vegeriya!

ESTRAGON (Bêhna xwe dide û distîne): Nalet bi ser min de bariya!

VLADIMIR: Tu çûbû ku? Min texmîn kir ku tu ê careke

84

din venegerî.

ESTRAGON: Ez heta serê serkêş çûbûm. Hinek tên.

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Çend kes in?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR (Mîtta şerê xwe qezenc kiribe): Divê Godot be!

Herî dawî! (Bi heyecan Estragon hemêz dike û maçî dike.) Godot! Ev Godot ye! Em xelas bûn! Heydê em herin pêşiya wî! Were! (Estragon ber bi kulîsê ve dikişîne, Estragon ii ber xwe dide, xwe xeias dike, bi bazdan ji kulîsa din derdikeve.) Gogo! Bi paş de vegere! (Bêdengî. Vladimir ber bi kulîsa ku Estragon jê derketibû ve direve, ii dûr dinere. Estragon bi carekê ve dikeve hutidur, direve ba Viadimir. Vladimir li wî dizîvire.) Dêmek tu dîsan vegeriya!

ESTRAGON: Ez çûm ba şeytanan!

VLADIMIR: Ma tu dûr çû?

ESTRAGON: Ez çûm heta serê kêş.

VLADIMIR: Tiştê tê fêhmkirin, em di bilindahiyê mîna tepsiyekê de ne. Dêmek em di hundurê tepsiyê de têne pêşkêş kirin.

ESTRAGON: Ji wir jî hinek tên.

VLADIMIR: Dora me hate girtin. (Estragon bi rewşeke ku aqilê wî ji serê wî çûye, ber bi perdeya fonê ve direve, xwe li perdê digerîne, dikeve.) Gêjik! Riya derketinê di wir de tune. (Vladimir diçe ku wî rake, wî ber bi rampê ve tîne. Ber bi temaşevanan ve hereketekê dike.) Li vir hîç kesek tune. Ji vir baz de. Heydê. (Wî ber bi kortala sehnê ve dehf dide. Estragon di hundurê dehşetê de berepaş ve-

85

din venegerî.

ESTRAGON: Ez heta serê serkêş çûbûm. Hinek tên.

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Çend kes in?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR (Mîtta şerê xwe qezenc kiribe): Divê Godot be!

Herî dawî! (Bi heyecan Estragon hemêz dike û

maçî dike.) Godot! Ev Godot ye! Em xelas bûn!

Heydê em herin pêşiya wî! Were! (Estragon ber bi

kulîsê ve dikişîne, Estragon ii ber xwe dide, xwe

xeias dike, bi bazdan ji kulîsa din derdikeve.) Gogo!

Bi paş de vegere! (Bêdengî. Vladimir ber bi

kulîsa ku Estragon jê derketibû ve direve, ii dûr

dinere. Estragon bi carekê ve dikeve hutidur, direve

ba Viadimir. Vladimir li wî dizîvire.) Dêmek tu

dîsan vegeriya!

ESTRAGON: Ez çûm ba şeytanan!

VLADIMIR: Ma tu dûr çû?

ESTRAGON: Ez çûm heta serê kêş.

VLADIMIR: Tiştê tê fêhmkirin, em di bilindahiyêke mîna

tepsiyekê de ne. Dêmek em di hundurê tepsiyê de

têne pêşkêş kirin.

ESTRAGON: Ji wir jî hinek tîn.

VLADIMIR: Dora me hate girtin. (Estragon bi rewşeke ku

aqilê wî ji serê wî çûye, ber bi perdeya fonê ve direve,

xwe li perdê digerîne, dikeve.) Gêjik! Riya

derketinê di wir de tune. (Vladimir diçe ku wî

rake, wî ber bi rampê ve tîne. Ber bi temaşevanan

ve hereketekê dike.) Li vir hîç kesek tune. Ji vir

baz de. Heydê. (Wî ber bi kortala sehnê ve dehf dide. Estragon di hundurê dehşetê de berepaş ve-

85

dikşe.) Ma tu naxwazî? Temam, min fêhm kir. Ka raweste. (Difikire.) Tiştê ku tu bikî, ji vir winda bibe.

ESTRAGON: Herim ku?

VLADIMIR: Here pişt darê. (Estragon dudilî dibe.) Zûka!

Xwe li pişt darê veşêre. (Estragon baz dide xwe li pişt darê vedişêre, lê dar bi zorê wî nivco vedişêre.) Êdî tevnêlive! (Estragon ji pişt darê derdikeve.) Ev dara ha jî bi kêrî tu karê me nehat. (Ji Estragon re) Ma tu dîn dibî, çi ye?

ESTRAGON (hê sakîntir): Aqilê min bi carekê ve ji serê min çû. (Bi şermî serê xwe bera ber xwe dide.) Bibuhure! (Ji ber xwe bi gûrûr serê xwe radike.) Êdî çû! Tu ê ji niha û pê ve bibînî! Ji min re bibêje bê divê ez çi bikim.

VLADIMIR: Tu tiştêkî ku bête kirin tune ye.

ESTRAGON: Tu ê li vir nobetê bigirî. (Vladimir ber bi kulîsa çepê ve dibe, piştta wî li sehnê, wî li cihê ku rête re derbas dibe bi cih dike.) Temam, tev nelive, çavên xwe veke. (Ber bi kulîsa din ve direve. Vladimir di ser milê xwe re li wî dinihêre. Estragon radiweste, ii dîr dinihêre, bi paş ve vedigere. Ew di ser milên xwe re li hev dinihêrin.) Mîna wan kevnerojên xweş piştên wan li hev in! (Kurtedemekê lihevdunihêrîna xwe didomînin, paşê herdu jî çavên

xwe dadigerînin. Bêdengiyeke dirêj.) Gelo kesek naçin û nayên?

VLADIMIR (Li pişt xwe dizîvire): Çawan?

ESTRAGON (Bi dengê hê bilindtir): Ma kes naçin û nayên?

VLADIMIR: Na.

ESTRAGON Biminjîna.

86

dikşe.) Ma tu naxwazî? Temam, min fêhm kir. Ka raweste. (Difikire.) Tiştê ku tu bikî, ji vir winda bibe.

ESTRAGON: Herim ku?

VLADIMIR: Here pişt darê. (Estragon dudilî dibe.) Zûka!

Xwe li pişt darê veşêre. (Estragon baz dide xwe li pişt darê vedişêre, lê dar bi zorê wî nivco vedişêre.) Êdî tevnêlive! (Estragon ji pişt darê derdikeve.)

Ev dara ha jî bi kêrî tu karê me nehat. (Ji Estragon re) Ma tu dîn dibî, çi ye?

ESTRAGON (hê sakîntir): Aqilê min bi carekê ve ji serê min çû. (Bi şermî serê xwe bera ber xwe dide.) Bibuhure!

(Ji ber xwe bi gûrûr serê xwe radike.) Êdî çû! Tu ê ji niha û pê ve bibînî! Ji min re bibêje bê divê ez çi bikim.

VLADIMIR: Tu tiştêkî ku bête kirin tune ye.

ESTRAGON: Tu ê li vir nobetê bigirî. (Vladimir ber bi kulîsa çepê ve dibe, piştî wî li sehnê, wî li cihê ku rête re derbas dibe bi cih dike.) Temam, tev nelive, çavên xwe veke. (Ber bi kulîsa din ve direve. Vladimir di ser milê xwe re li wî dinihêre. Estragon radiweste,



ii dûr dinihêre, bi paş ve vedigere. Ew di ser milên xwe re li hev dinihêrin.) Mîna wan kevnerojên xweş piştên wan li hev in! (Kurtedemekê lihevdunihêrîna xwe didomînin, paşê herdu jî çavên xwe dadigerînin. Bêdengiyeyeke dirêj.) Gelo kesek naçin û nayên?

VLADIMIR (Li pişt xwe dizîvire): Çawan?

ESTRAGON (Bi dengê hê bilindtir): Ma kes naçin û nayên?

VLADIMIR: Na.

ESTRAGONBiminjîna.

86

(L/ hev dinihêrin. Bêdengiyeyeke dirêj.)

VLADIMIR: Herhal tu xapiya.

ESTRAGON (dizîvire): Çawan?

VLADIMIR (bi dengê hê bilindtir): Herhal tu xapiya.

ESTRAGON: Meqîre.

(L/ hev dinihêrin. Bêdengiyeyeke dirêj.)

VLADIMIR û ESTRAGON (Bi hev re dizîvirin): Gelo...

VLADIMIR: A, bibuhure!

ESTRAGON: Bibêje, ez guhdarî dikim.

VLADIMIR: Tu bibêje!

ESTRAGON: Tu bibêje!

VLADIMIR: Min peyva te birrî.

ESTRAGON: Tam berevajiya wê, min birrî!

(Bi hêrs li hevdu dinihêrin.)

VLADIMIR: Heydê, ne hewceyî merasimê ye.

ESTRAGON: înad meke, heydê bibêje.

VLADIMIR (dengê xwe bilind dike): Gotina xwe xelas bike.

ESTRAGON (bi eynî celebî): Tu gotina xwe xelas bike.  
(Bêdengî. Ber bi hev dimeşin, radiwestin.)

VLADIMIR: Pêxwas!

ESTRAGON: Temam, em ji hev re çêran bikin. (Ji hev re çêran dikin. Bêdengî.) Heydê, em niha li hev werin.

VLADIMIR: Gogo!

ESTRAGON: Didi!

VLADIMIR: Destê xwe bide min!

ESTRAGON: Ji te re!

VLADIMIR: Were hemêza min!

ESTRAGON: Werim hemêza te?

VLADIMIR (Milên xwe vedike): Were hemêza min!  
(Hevdu hemêz dikin. Bêdengî,)

87

(L/ hev dinihêrin. Bêdengiyeke dirêj.)

VLADIMIR: Herhal tu xapiya.

ESTRAGON (dizîvire): Çawan?

VLADIMIR (bi dengê hê bilindtir): Herhal tu xapiya.

ESTRAGON: Meqîre.

(L/ hev dinihêrin. Bêdengiyeke dirêj.)

VLADIMIR û ESTRAGON (Bi hev re dizîvirin): Gelo...

VLADIMIR: A, bibuhure!

ESTRAGON: Bibêje, ez guhdarî dikim.

VLADIMIR: Tu bibêje!

ESTRAGON: Tu bibêje!

VLADIMIR: Min peyva te birrî.

ESTRAGON: Tam berevajiya wê, min birrî!

(Bi hêrs li hevdu dinihêrin.)

VLADIMIR: Heydê, ne hewceyî merasimê ye.

ESTRAGON: înad meke, heydê bibêje.

VLADIMIR (dengê xwe bilind dike): Gotina xwe xelas bike.

ESTRAGON (bi eynî celebî): Tu gotina xwe xelas bike.

(Bêdengî. Ber bi hev dimeşin, radiwestin.)

VLADIMIR: Pêxwas!

ESTRAGON: Temam, em ji hev re çêran bikin. (Ji hev re çêran dikin. Bêdengî.) Heydê, em niha li hev werin.

VLADIMIR: Gogo!

ESTRAGON: Didi!

VLADIMIR: Destê xwe bide min!

ESTRAGON: Ji te re!

VLADIMIR: Were hemêza min!

ESTRAGON: Werim hemêza te?

VLADIMIR (Milên xwe vedike): Were hemêza min!

(Hevdu hemêz dikin. Bêdengî,)

87

ESTRAGON: Em ê niha çî bikin?

VLADIMIR: Li benda. 5...;,,, / ;;r

ESTRAGON Li benda. y;i.^,v

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma em hereketên xwe yên laşî bikin?

ESTRAGON: Hereketên xwe.

VLADIMIR: Ji bo em nerm bibin.

ESTRAGON: Sistbûn.

VLADIMIR: Veger.

ESTRAGON: Sistbûn.

VLADIMIR: Ji bo germbûnê.

ESTRAGON: Ji bo sakînbûnê.

VLADIMIR: Ma em dest pê bikin?

(Xwe hol dike. Estragon jî zarî wî dike.)

ESTRAGON (radiweste): Evqas bes e. Ez westiyam.

VLADIMIR (radiweste): Em ne bi antreman in. Lê em hebekî bêhna xwe berdin.

ESTRAGON: Ez bêhnê nagirim ku.

VLADIMIR: Baş e. (Radiweste.) Wê çaxê ji bo dengeyê em hereketa daran bikin.

ESTRAGON: Dar?

(Vladimir bi şewişîn hereketa daran dike.)

VLADIMIR (radiweste.): Dora te ye.

(Estragon jî bi şewişîn hereketa daran dike.)

ESTRAGON: Gelo Xwedê min dibîne?

VLADIMIR: Divê tu çavên xwe bigirî.

(Estragon çavên xwe digire, hê bêtir dişewişe.)

ESTRAGON (radiweste, kulmên xwe ii ba dike û diqîre):

Xwedêyo, bila gunehê te bi min were!

VLADIMIR (// zora wîçûye); Lê bi min?

ESTRAGON (eynî hereket.) Bila, bila, bila gunehê te bi min were!

88

ESTRAGON: Em ê niha çi bikin?

VLADIMIR: Li benda. 5...; ; ; ; / ; ; r

ESTRAGON Li benda. y; i. ^, v

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma em hereketên xwe yên laşî bikin?

ESTRAGON: Hereketên xwe.

VLADIMIR: Ji bo em nerm bibin.

ESTRAGON: Sistbûn.

VLADIMIR: Veger.

ESTRAGON: Sistbûn.

VLADIMIR: Ji bo germbûnê.

ESTRAGON: Ji bo sakînbûnê.

VLADIMIR: Ma em dest pê bikin?

(Xwe hol dike. Estragon jî zarî wî dike.)

ESTRAGON (radiweste): Evqas bes e. Ez westiyam.

VLADIMIR (radiweste): Em ne bi antreman in. Lê em hebekî bêhna xwe berdin.

ESTRAGON: Ez bêhnê nagirim ku.

VLADIMIR: Baş e. (Radiweste.) Wê çaxê ji bo dengeyê em hereketa daran bikin.

ESTRAGON: Dar?

(Vladimir bi şewişîn hereketa daran dike.)

VLADIMIR (radiweste.): Dora te ye.

(Estragon jî bi şewişîn hereketa daran dike.)

ESTRAGON: Gelo Xwedê min dibîne?

VLADIMIR: Divê tu çavên xwe bigirî.

(Estragon çavên xwe digire, hê bêtir dişewişe.)

ESTRAGON (radiweste, kulmên xwe ii ba dike û diqîre):

Xwedêyo, bila gunehê te bi min were!

VLADIMIR (// zora wîçûye); Lê bi min?

ESTRAGON (eynî hereket.) Bila, bila, bila gunehê te bi min were!

88

(Pozzo û Lucky dikevin hundur. Pozzo kor bûye.)

Lucky mîna perdeya yekemîn bi bar e. Benek di stûyê wî de ye, lê ji bo ku Pozzo bikanibe bi hêsanî bibîne, ben kurt kiriye. Sewqeyekî nû ii serê Lucky ye. Gava ew Vladimir û Estragon dibîne, radiweste. Pozzo meşa xwe didomîne û li Luckyê ku rawestiyaye diqelibe. Vladimir û Estragon bi paş ve vedikişin.)

POZZO (Nêzîkî Lucky dibe, Lucky di bin vî barê giran de dişewişe.): Çi bûye? Kî qîriya?

(Lucky her tiştên ku hilgirtiyê berdide û dikeve xwarê, Pozzo jî bi xwe re dixîne. Ew di nava barê xwe de xwe dirêj dikin.)

ESTRAGON: Ma ev Godot ye?

VLADIMIR: Li ser teriya xwe rûnişt. (Bi Estragon re ber bi koma li erdê ve diçe.) Dawî dawî va ye alîkarî ji me re hat!

POZZO (bi dengê bêşexsiyet): Hawar!

ESTRAGON: Ma ev Godot ye?

VLADIMIR: Debarkirin tam hatibû sînorê hêza me, ev e fermo, şahiya êvarê hate ber lingên me.

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Alîkariyê dixwaze.

VLADIMIR: Li benda şevê, li benda Godot, libendebûn - ji bo libendemayînê êdî em ne bi tenê ne. Hemû şevê me bi îmkanên xwe têkoşîn da. Edî tamam. Em ji niha ve gihîştine sibehê.

ESTRAGON: Lê ew bi tenê di vir re derbas dibin.

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Êdî demê dest pê kiriye û bi celebekî din dibuhure.

Wê roj here ava, hîv hilê û em ê jî herin - ji

vir.

89

(Pozzo û Lucky dikevin hundur. Pozzo kor bûye.

Lucky mîna perdeya yekemîn bi bar e. Benek di

stûyê wî de ye, lê ji bo ku Pozzo bikanibe bi hêsanî

bibîne, ben kurt kiriye. Sewqeyekî nû ii serê

Lucky ye. Gava ew Vladimir û Estragon dibîne,

radiweste. Pozzo meşa xwe didomîne û li Luckyê

ku rawestiyaye diqelibe. Vladimir û Estragon bi

paş ve vedikişin.)

POZZO (Nêzîkî Lucky dibe, Lucky di bin vî barê giran de

dişewiše.): Çi bûye? Kî qîriya?

(Lucky her tiştên ku hilgirtiyê berdide û dikeve

xwarê, Pozzo jî bi xwe re dixîne. Ew di nava barê

xwe de xwe dirêj dikin.)

ESTRAGON: Ma ev Godot ye?

VLADIMIR: Li ser teriya xwe rûnişt. (Bi Estragon re ber bi

koma li erdê ve diçe.) Dawî dawî va ye alîkarî ji

me re hat!

POZZO (bi dengê bêşexsiyet): Hawar!

ESTRAGON: Ma ev Godot ye?

VLADIMIR: Debarkirin tam hatibû sînorê hêza me, ev e

fermo, şahiya êvarê hate ber lingên me.

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Alîkariyê dixwaze.

VLADIMIR: Li benda şevê, li benda Godot, libendebûn - ji

bo libendemayinê êdî em ne bi tenê ne. Hemû şevê me bi îmkanên xwe têkoşîn da. Edî tamam. Em ji niha ve gihîştine sibehê.

ESTRAGON: Lê ew bi tenê di vir re derbas dibin.

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Êdî demê dest pê kiriye û bi celebekî din dibuhure.

Wê roj here ava, hîv hilê û em ê jî herin - ji vir.

89

ESTRAGON: Lê ew bi tenê di vir re derbas dibin.

VLADIMIR: Ew jî bes e.

POZZO: Bila gunehê we bi min were!

VLADIMIR: Pozzoyê reben!

ESTRAGON: Min dizanîbû ew e.

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Godot.

VLADIMIR: Ev ne Godot ye ku.

ESTRAGON: Lê kî ye?

VLADIMIR: Ev Pozzo ye.

POZZO: Ez im! Ez im! Min rakin ser lingan!

VLADIMIR: Ew nikane rabe ser xwe.

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Belkî ji bo te çend hestiyên din jî hebin.

ESTRAGON: Hestî?



VLADIMIR: Hestiyên fêrîkan. Ma nayê bîra te?

ESTRAGON: Ma ew ev bû?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ka bipirse.

VLADIMIR: Ger me pêşî alîkarî bikira?

ESTRAGON: Biçîwîre?

VLADIMIR: Ji bo ku ew bikanibe rabe ser lingan.

ESTRAGON: MA EW BI XWE NIKANE RABE SER XWE?

VLADIMIR: Dixwaze rabe.

ESTRAGON: Wê çaxê bila rabe.

VLADIMIR: Nikane rabe.

ESTRAGON: Çima nikane?

90

ESTRAGON: Lê ew bi tenê di vir re derbas dibin.

VLADIMIR: Ew jî bes e.

POZZO: Bila gunehê we bi min were!

VLADIMIR: Pozzoyê reben!

ESTRAGON: Min dizanîbû ew e.

VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Godot.

VLADIMIR: Ev ne Godot ye ku.

ESTRAGON: Lê kî ye?

VLADIMIR: Ev Pozzo ye.

POZZO: Ez im! Ez im! Min rakin ser lingan!

VLADIMIR: Ew nikane rabe ser xwe.

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e.

VLADIMIR: Belkî ji bo te çend hestiyên din jî hebin.

ESTRAGON: Hestî?

VLADIMIR: Hestiyên fêrîkan. Ma nayê bîra te?

ESTRAGON: Ma ew ev bû?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ka bipirse.

VLADIMIR: Ger me pêşî alîkarî bikira?

ESTRAGON: Biçîwîre?

VLADIMIR: Ji bo ku ew bikanibe rabe ser lingan.

ESTRAGON: MA EW BI XWE NIKANE RABE SER

XWE?

VLADIMIR: Dixwaze rabe.

ESTRAGON: Wê çaxê bila rabe.

VLADIMIR: Nikane rabe.

ESTRAGON: Çima nikane?

90

VLADIMIR: Ez çi zanim.

(Pozzo xwe di erdê dide, dinale, kulman li erdê dixê.)

ESTRAGON: Me pêşî pirsî hestiyên bikira? Ger ew nede em ê wî li wir bihêlin.

VLADIMIR: Yanî tu dixwazî bibêjî ku jiyana wî di destên me de ye?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Ma ji bo ku em alîkariya wî bikin, gelo em hin şertan biavêjin ortê?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Bi rastî jî mîna ku tiştekek bîaqilî ye. Lê tiştekekî ku min dixê meraqê heye.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Lê ku Lucky bi carekê ve har bibe û her tiştî ser û bin bike. A wê çaxê di devê me de tê rîtin.

ESTRAGON: Lucky?

VLADIMIR: Do wî êrîşî te kir.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim, deh kes bûn.

VLADIMIR: Na, pêşî wî pehîn li te xist.

ESTRAGON: Ma ew niha li vir e?

VLADIMIR: Binêre, wa ye ew li wir e. (Nîşan dide.) Niha ew bêhereket ramedyaye. Lê her dem dikane zirdî-nîtiyê bike.

ESTRAGON: Ma em her du bi hev re li vir têr li wî xin, hi?

VLADIMIR: Yanî em di xew de li wî xin?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Fikreke baş e. Lê ma em ê bikanibin bi ser bikevin?

Gelo bi rastî ew raza ye? (Demek.) Na, ya baş ew e em rawestin ta ku Pozzo ji bo alîkariyê bang bike, wê çaxê em ê alîkariya wî bikin û em ê wilo bawer bin ku ew ê spasdarê me be.

91

VLADIMIR: Ez çî zanim.

(Pozzo xwe di erdê dide, dinale, kulman li erdê dixê.)

ESTRAGON: Me pêşî pirsar hestiyar bikira? Ger ew nede em ê wî li wir bihêlin.

VLADIMIR: Yanî tu dixwazî bibêjî ku jiyana wî di destên

me de ye?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Ma ji bo ku em alîkariya wî bikin, gelo em hin şertan biavêjin ortê?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Bi rastî jî mîna ku tişteke biaqilî ye. Lê tişteke ku min dixê meraqê heye.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Lê ku Lucky bi carekê ve har bibe û her tiştî ser û bin bike. A wê çaxê di devê me de tê rîtin.

ESTRAGON: Lucky?

VLADIMIR: Do wî êrîşî te kir.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim, deh kes bûn.

VLADIMIR: Na, pêşî wî pehîn li te xist.

ESTRAGON: Ma ew niha li vir e?

VLADIMIR: Binêre, wa ye ew li wir e. (Nîşan dide.) Niha ew bêhereket ramedyaye. Lê her dem dikane zirdî-nîtiyê bike.

ESTRAGON: Ma em her du bi hev re li vir têr li wî xin, hi?

VLADIMIR: Yanî em di xew de li wî xin?

ESTRAGON: Erê.

VLADIMIR: Fikreke baş e. Lê ma em ê bikanibin bi ser bikevin?

Gelo bi rastî ew raza ye? (Demek.) Na, ya

baş ew e em rawestin ta ku Pozzo ji bo alîkariyê

bang bike, wê çaxê em ê alîkariya wî bikin û em ê

wilo bawer bin ku ew ê spasdarê me be.

91

ESTRAGON: Ew êdî alîkariyê naxwaze. ""\* > VLADIMIR: Ji ber ku wî hêviya xwe birriye.

ESTRAGON Dibe.lê...

VLADIMIR: Em vê dema xwe bi peyvên vala ve nebuhurînin. (Demek. Bi germî) Hê ku firsend ketiye destên me em tiştinan bikin! Ev alîkarî, ne tişteki ku her tim ji me tête xwestin e. Ne ku ew hewcedarî me ye. Kî be wê bikanibe eynî tiştî bike. Ev banga alîkariyê ji me wêdetir ji hemû mirovatiyê re ye.

Lê a niha, li vir, bi dilê me be ne bi dil me be, mirovatî em in. Hê ku pir dereng nebûbe em ji vê destkewtî bibin. Qet nebe em carekê temsîlkariya vê rezaleta ku em jî perçeyek jê ne, bikin. Tu çi dibêjî?

ESTRAGON: Min guhdarî nekir.

VLADIMIR: Ev jî rastiyeke din e ku gava em milên xwe vedikin û rastiye dipîvin, em dîsan sînga mirovatiyê dinepixin. Gava piling alîkariya cinsê xwe dike ew deqîqeyekê jî nafikire. An jî ew bi nava daristanê ve baz dide. Lê pirsgerêk ne ev e. Em li vir çi dikin, pirs ku em ji xwe bipirsin ev e. Em pirr bi şans in ku em bersiva wê dizanin. Erê, di vê tevliheviya mezin de tişteki vekirî û eşkere heye, ew jî ev e: em li benda hatina Godot ne.

ESTRAGON Raste.

VLADIMIR: An jî em li benda şevê ne. (Demek.) Em ji bo hevdudîtîni li vir in, evqas. Em ne ezîz filan in, lê em ji bo hevdudîtîni li vir in. Ma wekî din çend kes dikanin eynî tiştî bibêjin?

ESTRAGON: Pir kes.

VLADIMIR: Rast e?

ESTRAGON: Ez nizanim.

92

ESTRAGON: Ew êdî alîkariyê naxwaze. ""\* > VLADIMIR: Ji ber ku wî hêviya xwe birriye.

ESTRAGON: Dibe.lê...

VLADIMIR: Em vê dema xwe bi peyvên vala ve nebuhurînin. (Demek. Bi germî) Hê ku firsend ketiye destên me em tiştinan bikin! Ev alîkarî, ne tişteki ku her tim ji me têtê xwestin e. Ne ku ew hewcedarî me ye. Kî be wê bikanibe eynî tiştî bike. Ev banga alîkariyê ji me wêdetir ji hemû mirovatiyê re ye.

Lê a niha, li vir, bi dilê me be ne bi dil me be, mirovatî em in. Hê ku pir dereng nebûbe em ji vê destkewtî bibin. Qet nebe em carekê temsîlkariya vê rezaleta ku em jî perçeyek jê ne, bikin. Tu çi dibêjî?

ESTRAGON: Min guhdarî nekir.

VLADIMIR: Ev jî rastiyeke din e ku gava em milên xwe vedikin û rastiye dipîvin, em dîsan sînga mirovatiyê dinepixînin. Gava piling alîkariya cinsê xwe dike ew deqîqeyekê jî nafikire. An jî ew bi nava daristanê ve baz dide. Lê pirsgerêk ne ev e. Em li vir çi dikin, pirsê ku em ji xwe bipirsin ev e. Em pîr bi şans in ku em bersiva wê dizanin. Erê, di vê tevliheviya mezin de tişteki vekirî û eşkere heye, ew jî ev e: em li benda hatina Godot ne.

ESTRAGON: Raste.

VLADIMIR: An jî em li benda şevê ne. (Demek.) Em ji bo hevdudîtinê li vir in, evqas. Em ne ezîz filan in, lê em ji bo hevdudîtinê li vir in. Ma wekî din çend kes dikanin eynî tiştî bibêjin?

ESTRAGON: Pir kes.

VLADIMIR: Rast e?

ESTRAGON: Ez nizanim.

92

VLADIMIR: Dibe.

POZZO: Hawar!

VLADIMIR: Lê rastiyekek heye, ew jî ev e ku, di vê rewşê de derbasnebûna demê ye û em mecbûr in ku bi hin herketan vê demê dagirin; tu ê bibêjî ku di awira pêşî de, ji ber ku ev nêzîkî aqilan e em dikin. Tu ji vir û mala Xwedê mafdar î. Lê, ez jî carinan ji xwe dipirsim, gelo ma aqilê me di kûrahiyên şevên berdewam de digere. Bala te li ser gotinên min e?

ESTRAGON: Em hemû dîn têne dinyayê. Hin ji me her wilo dimînin.

POZZO: Hawar, ez ê peran bidime we!

ESTRAGON: Çiqasî?

POZZO: Sed frangî.

ESTRAGON: Kêm e.

VLADIMIR: Tu jî zêde pêş de çû.

ESTRAGON: Ma bi te têr dike?

VLADIMIR: Na, ez behsa wê nakim, ez behsa nêrîna te ya gava ku ez hatime dinyayê ku hişê min ne li serê

min bû, dikim. Lê belê pirsgirêk ne ew e jî.

POZZO: Dused.

VLADIMIR: Em li bende ne. Em aciz bûn. (Destê xwe bilind dike.) Na, li dij dernekeve, em ji acizî wextî biteqin, ev yeka han rastiyeke e. Baş e. Guhertinek derdikeve hemberî me, baş e, em çî dikin? Ji bo ku ew li wir genî bibe, em wî li wir dihêlin. Heydê, dest bi kar bike. (Ber bi Pozzo ve diçe, radiweste.) Wê piştî kêliyêk din qet tişteke nemîne û em ê jî dîsan bi tenê bimînin, em ê di nava tenêtiyan de bimînin. (Dikeve xeyalan.)

POZZO: Dused!

93

VLADIMIR: Dibe.

POZZO: Hawar!

VLADIMIR: Lê rastiyeke heye, ew jî ev e ku, di vê rewşê de derbasnebûna demê ye û em mecbûr in ku bi hin herketan vê demê dagirin; tu ê bibêjî ku di awira pêşî de, ji ber ku ev nêzîkî aqilan e em dikin. Tu ji vir û mala Xwedê mafdar î. Lê, ez jî carinan ji xwe dipirsim, gelo ma aqilê me di kûrahiyên şevên berdewam de digere. Bala te li ser gotinên min e?

ESTRAGON: Em hemû dîn têne dinyayê. Hin ji me her wilo dimînin.

POZZO: Hawar, ez ê peran bidime we!

ESTRAGON: Çiqasî?

POZZO: Sed frangî.



ESTRAGON: Kêm e.

VLADIMIR: Tu jî zêde pêş de çû.

ESTRAGON: Ma bi te têr dike?

VLADIMIR: Na, ez behsa wê nakim, ez behsa nêrîna te ya gava ku ez hatime dinyayê ku hişê min ne li serê min bû, dikim. Lê belê pirsgirêk ne ew e jî.

POZZO: Dused.

VLADIMIR: Em li bende ne. Em aciz bûn. (Destê xwe bilind dike.) Na, li dij dernekeve, em ji acizî wextî biteqin, ev yeka han rastiyeke e. Baş e. Guhertinek derdikeve hemberî me, baş e, em çi dikin? Ji bo ku ew li wir genî bibe, em wî li wir dihêlin. Heydê, dest bi kar bike. (Ber bi Pozzo ve diçe, radiweste.) Wê piştî kêliyêk din qet tiştêk nemîne û em ê jî dîsan bi tenê bimînin, em ê di nava tenêtiyan de bimînin. (Dikeve xeyalan.)

POZZO: Dused!

93

VLADIMIR: Em tên.

(Hewl dide ku Pozzo rake, nikane, careke din diceribîne, lingê wî bi alavên li erdê diwerqile ew jî dikeve, dixwaze rabe ser xwe, nikane.)

ESTRAGON: Ev çi bi we hemûyan hatiye?

VLADIMIR: Hawar!

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Tu nikanî min bihêlî û herî! Ew ê min bikujin!

POZZO: Ez li ku me?

VLADIMIR: Gogo!

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Alîkariya min bike!

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Pêşî alîkariya min bike. Em ê paşê bi hev re herin.

ESTRAGON: Bi soz?

VLADIMIR: Bi soz! Ez sond dixwim!

ESTRAGON: Em ê careke din jî bi paş ve venegerin.

VLADIMIR: Em ê neyên.

ESTRAGON: Em ê herin Ariêge'yê.

VLADIMIR: Ger tu bixwazî em ê herin wir.

POZZO: Sêsed! Çarsed!

ESTRAGON: Min her xwestiye ku ez li Ariêge'yê bigerim.

VLADIMIR: Mîna ku tu bixwazî tu ê bigerî.

ESTRAGON: Kê gû kir?

VLADIMIR: Pozzo.

POZZO: Min kir, min! Bila gunehê we bi min were!

ESTRAGON: Ev tiştê kirê e.

VLADIMIR: Zûka! Zû! Destê xwe bide min!

ESTRAGON: Ez diçim. (Demek. Bi dengekîhê bilindtir.) Ez diçim.

VLADIMIR: Ger tu bixwazî, ez bi xwe jî dikanim rabim ser  
94

VLADIMIR: Em tên.

(Hewl dide ku Pozzo rake, nikane, careke din diceribîne, lingê wî bi alavên li erdê diwerqile ew jî dikeve, dixwaze rabe ser xwe, nikane.)

ESTRAGON: Ev çi bi we hemûyan hatiye?

VLADIMIR: Hawar!

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Tu nikanê min bihêlê û herê! Ew ê min bikujin!

POZZO: Ez li ku me?

VLADIMIR: Gogo!

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Alîkariya min bike!

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Pêşê alîkariya min bike. Em ê paşê bi hev re herin.

ESTRAGON: Bi soz?

VLADIMIR: Bi soz! Ez sond dixwim!

ESTRAGON: Em ê careke din jî bi paş ve venegerin.

VLADIMIR: Em ê neyên.

ESTRAGON: Em ê herin Ariêge'yê.

VLADIMIR: Ger tu bixwazî em ê herin wir.

POZZO: Sêsed! Çarsed!

ESTRAGON: Min her xwestiye ku ez li Ariêge'yê bigerim.

VLADIMIR: Mîna ku tu bixwazî tu ê bigerî.

ESTRAGON: Kê gû kir?

VLADIMIR: Pozzo.

POZZO: Min kir, min! Bila gunehê we bi min were!

ESTRAGON: Ev tişteki kirê e.

VLADIMIR: Zûka! Zû! Destê xwe bide min!

ESTRAGON: Ez diçim. (Demek. Bi dengekîhê bilindtir.) Ez diçim.

VLADIMIR: Ger tu bixwazî, ez bi xwe jî dikanim rabim ser

94

xwe. (Diceribîne, dikeve.) Çawan be ez ê rabim.

ESTRAGON: Çî te heye?

VLADIMIR: Biqêşite, here.

ESTRAGON: Ma tu li vir dimînî?

VLADIMIR: Gavê.

ESTRAGON: Rabe ser xwe, tu ê serma bigirî.

VLADIMIR: Tu têkilî min nebe.

ESTRAGON: Weha meke, Didi, înad meke. (Hema ku ew destê xwe dirêjî Vladimir dike, Vladimir bi destê wîdigire.) Heydê, rabe!

VLADIMIR: Bikişîne!

(Estragon dikişîne, dişewişe, ew jî dikeve. Bêdengiyeke dirêj.)

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Em jî li vir in.

POZZO: Hûnkîne?

VLADIMIR: Em mirov in.

(Bêdengî)

ESTRAGON: Erd çiqas rehet e!

VLADIMIR: Ma tu dikanî rabî?

ESTRAGON: Ez nizamim.

VLADIMIR: Biceribîne.

ESTRAGON: Paşê, piştî kêliyekê.

(Bêdengî)

POZZO: Çi bû?

VLADIMIR (bi qêrîn): Tu ê bêdeng bibî, ha? Ev mêrik ji kolerayê xerabtir e! Ew bi tenê li xwe difikire.

ESTRAGON: Ma em razên?

VLADIMIR: Te bihîst? Ew dixwaze bizanibe bê çi ye.

ESTRAGON: Dev ji wî berde. Xwe dirêj bike û razê.

(Bêdengî)

POZZO: Bila gunehê we bi min were! Gunehê we!

95

xwe. (Diceribîne, dikeve.) Çawan be ez ê rabim.

ESTRAGON: Çî te heye?

VLADIMIR: Biqêşite, here.

ESTRAGON: Ma tu li vir dimînî?

VLADIMIR: Gavê.

ESTRAGON: Rabe ser xwe, tu ê serma bigirî.

VLADIMIR: Tu têkilî min nebe.

ESTRAGON: Weha meke, Didi, înad meke. (Hema ku ew

destê xwe dirêjî Vladimir dike, Vladimir bi destê

wîdigire.) Heydê, rabe!

VLADIMIR: Bikişîne!

(Estragon dikişîne, dişewişe, ew jî dikeve. Bêdengiyeke

dirêj.)

POZZO: Min xelas bikin!

VLADIMIR: Em jî li vir in.

POZZO: Hûnkîne?

VLADIMIR: Em mirov in.

(Bêdengî)

ESTRAGON: Erd çiqas rehet e!

VLADIMIR: Ma tu dikanî rabî?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Biceribîne.

ESTRAGON: Paşê, piştî kêliyêkê.

(Bêdengî)

POZZO: Çi bû?

VLADIMIR (bi qêrîn): Tu ê bêdeng bibî, ha? Ev mêrik ji kolerayê xerabtir e! Ew bi tenê li xwe difikire.

ESTRAGON: Ma em razên?

VLADIMIR: Te bihîst? Ew dixwaze bizanibe bê çi ye.

ESTRAGON: Dev ji wî berde. Xwe dirêj bike û razê.

(Bêdengî)

POZZO: Bila gunehê we bi min were! Gunehê we!

95

ESTRAGON (ji cihê xwe dipengize): Çi! Çi bûye?

VLADIMIR: Ma tu raza bû?

ESTRAGON: Ez bawer im.

VLADIMIR: Dîsan ev heramê Pozzo ye!

ESTRAGON: Jê re bibêje bila devê xwe bigire! Dev û pozê wî bişkîne!

VLADIMIR (// Pozzo dixê): Temam! Tu ê devê xwe bigirî!

Zîro! (Pozzo ji ber êşê dike qêrîn, xwe bi erdê ve dikişkişie û bi dûr dikeve. Ew carinan di nav re radiweste, gava bang Lucky dike bi herektên korî li hewa dixê. Vladimir xwe dispêre ser enîşka xwe û li wîtemaşê dike.) Xelas bû! (Bêdengî) Ket!

ESTRAGON: Ma ew rabûbû ser xwe?

VLADIMIR: Na.

ESTRAGON: Lê, te got, ew ket.

VLADIMIR: Rabûye ser çongên xwe. (Bêdengî) Ez bawer im em hebekî bi pêş de çûn.

ESTRAGON: Ev her tim nabe.

VLADIMIR: Wî bi bergerîn alîkarî ji me xwest. Me guhên xwe girtin. Wî israr kir. Hingê me li wî xist.

ESTRAGON: Rast e. VLADIMIR: Ew qet tevnalîve. Belkî jî miriye.

ESTRAGON: Ji ber ku me xwest em alîkariya wî bikin, em di vî gûyî dabûn.

VLADIMIR: Rast e.

ESTRAGON: Te pir bi hêz lê nexist, ne wilo?

VLADIMIR: Eh, min ew hebekî mist da.

ESTRAGON: Diviyabû te nekira.

VLADIMIR: Te xwest.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Em ê niha çi bikin?

VLADIMIR: Ez bikarîbûma bi zikkêşkê biçûma ba wî.

ESTRAGON: Min mehêle!

96

ESTRAGON (ji cihê xwe dipengize): Çi! Çi bûye?

VLADIMIR: Ma tu raza bû?

ESTRAGON: Ez bawer im.

VLADIMIR: Dîsan ev heramê Pozzo ye!

ESTRAGON: Jê re bibêje bila devê xwe bigire! Dev û pozê wî bişkîne!

VLADIMIR (// Pozzo dixê): Temam! Tu ê devê xwe bigirî!

Zîro! (Pozzo ji ber êşê dike qîrîn, xwe bi erdê ve dikişkişie û bi dûr dikeve. Ew carinan di nav re radiweste, gava bang Lucky dike bi herektên korî li hewa dixê. Vladimir xwe dispêre ser enîşka xwe û li wîtemaşê dike.) Xelas bû! (Bêdengî) Ket!

ESTRAGON: Ma ew rabûbû ser xwe?

VLADIMIR: Na.

ESTRAGON: Lê, te got, ew ket.

VLADIMIR: Rabûye ser çongên xwe. (Bêdengî) Ez bawer im em hebekî bi pêş de çûn.

ESTRAGON: Ev her tim nabe.

VLADIMIR: Wî bi bergerîn alîkarî ji me xwest. Me guhên xwe girtin. Wî israr kir. Hingî me li wî xist.

ESTRAGON: Rast e. VLADIMIR: Ew qet tevnalîve. Belkî jî miriye.

ESTRAGON: Ji ber ku me xwest em alîkariya wî bikin, em di vî gûyî dabûn.

VLADIMIR: Rast e.

ESTRAGON: Te pir bi hêz lê nexist, ne wilo?

VLADIMIR: Eh, min ew hebekî mist da.

ESTRAGON: Diviyabû te nekira.

VLADIMIR: Te xwest.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Em ê niha çi bikin?

VLADIMIR: Ez bikarîbûma bi zikkêşkê biçûma ba wî.

ESTRAGON: Min mehêle!

96

VLADIMIR: Gelo ez bang wî bikim?

ESTRAGON: Temam, bang wî bike.

VLADIMIR, ESTRAGON: Pozzo! Pozzo!

VLADIMIR: Wa ye tevlîviya.

ESTRAGON: Ma tu êmin î ku navê wî Pozzo ye?

VLADIMIR (bi xemgînî): Mîrza Pozzo! Were ser hişê xwe!

Ez ê xerabiyekê bi te nekim!

(Bêdengî)

ESTRAGON: Em hin navên din biceribînin?

VLADIMIR: Ez ditirsim ku ew bi xedarî birîndar bûbe.



ESTRAGON: Ma xerab e, ji me re şahî ye.

VLADIMIR: Şahiya çi?

ESTRAGON: Li dû hev bikaranîna navên cihê. Wê wext derbas bikira. Me ê dawî dawî rastî bidîta.

VLADIMIR: Ez ji te re dibêjim navê wî Pozto ye.

ESTRAGON: Em ê niha bibînin. Ma bila navê wî çi be?  
(D//i£/re.)Habil!Habil!

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Te dît?

VLADIMIR: Êdî ez ji vê mijarê jî aciz bûm.

ESTRAGON: Belkî navê yê din jî Kabil e. (Battg dike.) Kabil!  
Kabil!

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Ev hemû mirovatî ye. (Bêdettgî) Li vî ewrê biçûk binêre.

VLADIMIR: (çavêtt xwe bi jor vedike): Li ku?

ESTRAGON: Li wir, li esmên.

VLADIMIR: Eêê? (Demek.) Çiyê wê tayberî heye? (Bêden-  
&)

ESTRAGON: Ma em derbasî mijareke din nebin?

VLADIMIR: Min ê ji te re eynî pêşniyaz bianiya.

ESTRAGON: Lêjiboçi?

97

VLADIMIR: Gelo ez bang wî bikim?

ESTRAGON: Temam, bang wî bike.

VLADIMIR, ESTRAGON: Pozzo! Pozzo!

VLADIMIR: Wa ye tevliviya.

ESTRAGON: Ma tu êmin î ku navê wî Pozzo ye?

VLADIMIR (bi xemgînî): Mîrza Pozzo! Were ser hişê xwe!  
Ez ê xerabiyekê bi te nekim!

(Bêdengî)

ESTRAGON: Em hin navên din biceribînin?

VLADIMIR: Ez ditirsim ku ew bi xedarî birîndar bûbe.

ESTRAGON: Ma xerab e, ji me re şahî ye.

VLADIMIR: Şahiya çi?

ESTRAGON: Li dû hev bikaranîna navên cihê. Wê wext derbas bikira. Me ê dawî dawî rastî bidîta.

VLADIMIR: Ez ji te re dibêjim navê wî Pozto ye.

ESTRAGON: Em ê niha bibînin. Ma bila navê wî çi be?

(D//i£/re.)Habil!Habil!

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Te dît?

VLADIMIR: Êdî ez ji vê mijarê jî aciz bûm.

ESTRAGON: Belkî navê yê din jî Kabil e. (Battg dike.) Kabil!  
Kabil!

POZZO: Min xelas bikin!

ESTRAGON: Ev hemû mirovatî ye. (Bêdettgî) Li vî ewrê bi-  
çûk binêre.

VLADIMIR: (çavêtt xwe bi jor vedike): Li ku?

ESTRAGON: Li wir, li esmên.

VLADIMIR: Eêê? (Demek.) Çiyê wê tayberî heye? (Bêden-  
&)

ESTRAGON: Ma em derbasî mijareke din nebin?

VLADIMIR: Min ê ji te re eynî pêşniyaz bianiya.

ESTRAGONLêjiboçi?

97

VLADIMIR: Ji xwe pirsgirêk ev e!

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma ji bo destpêkê em rabin ser lingan?

VLADIMIR: Em biceribînin.

(Radibin ser lingan.)

ESTRAGON: Ewqasî jî ne zor e.

VLADIMIR: Hemû kar, di xwestinê de ye.

ESTRAGON: Baş e, em niha çi dikin?

POZZO: Hawar!

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Em çi bikin?

POZZO: Hawar!

VLADIMIR: Ma em alîkariya wî bikin?

ESTRAGON: Em dikanin çi bikin?

VLADIMIR: Ew dixwaze rabe ser xwe.

ESTRAGON: Êê?

VLADIMIR: Ew dixwaze em alîkariya wî bikin da ew rabe

ser xwe. ESTRAGON: Temam, em alîkarî bikin. Ma em li benda çi

ne?

(Ew alîkariya Pozzo dikin ku ew rabe ser xwe; gava

ew ji ba Pozzo bi dûr dikevin, Pozzo dîsan dikeve.)

VLADIMIR: Divê em wî li ser lingan bigirin. (Eynî hereket.

Pozzo di navbera herduwan de, bi stûyên wan ve

daliqyayî dimîne.) Divê' ew ji nû ve hînî liserlinganmayinê

bibe. (Ji Pozzo re) Ma tu hebekî bi ser

xwe ve hatî?

POZZO:Hûnkîne?

98

VLADIMIR: Ji xwe pîrsgirêk ev e!

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma ji bo destpêkê em rabin ser lingan?

VLADIMIR: Em biceribînin.

(Radibin ser lingan.)

ESTRAGON: Ewqasî jî ne zor e.

VLADIMIR: Hemû kar, di xwestinê de ye.

ESTRAGON: Baş e, em niha çi dikin?

POZZO: Hawar!

ESTRAGON: Em ji vir herin.

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Em li benda Godot ne.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Em çi bikin?

POZZO: Hawar!

VLADIMIR: Ma em alîkariya wî bikin?

ESTRAGON: Em dikanin çi bikin?

VLADIMIR: Ew dixwaze rabe ser xwe.

ESTRAGON: Êê?

VLADIMIR: Ew dixwaze em alîkariya wî bikin da ew rabe

ser xwe. ESTRAGON: Temam, em alîkarî bikin. Ma em li benda çi ne?

(Ew alîkariya Pzzo dikin ku ew rabe ser xwe; gava

ew ji ba Pozzo bi dûr dikevin, Pozzo dîsan dikeve.)

VLADIMIR: Divê em wî li ser lingan bigirin. (Eynî hereket.

Pozzo di navbera herduwan de, bi stûyên wan ve daliqayî dimîne.) Divê' ew ji nû ve hînî liserlinganmayinê bibe. (Ji Pozzo re) Ma tu hebekî bi ser xwe ve hatî?

POZZO:Hûnkîne?

98

VLADIMIR: Ma te em nas nekirin?

POZZO: Ez kor im.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Belkî ew pêşerojê dibîne, ha?

VLADIMIR (Ji Pozzo re): Ji kengî ve?

POZZO: Çavên min gelekî saxlem bûn - lê gelo hûn dost in?

ESTRAGON (bi deng dikenin) Ew dipirse, ma em dost in!

VLADIMIR: Na, ew dixwaze bibêje, ma em dostên wî ne.

ESTRAGON: Wê çi bibe?

VLADIMIR: Jixwe wê bipirse. Me alîkariya wî kir.

ESTRAGON: Temam. Ma ku em ne dostên wî bûna, me ê ji ku alîkariya wî bikira?

VLADIMIR: Belkî.

ESTRAGON: Jixwe.

VLADIMIR: Em vê zêde tevnedin.

POZZO: Ma hûn ne rêbir in?

ESTRAGON: Rêbir? Kê dera me dişibe rêbiran?

VLADIMIR: Dev jê berde! Kor e.

ESTRAGON: Hela hela! Raste yaho. (Demek.)

POZZO: Min mehêlin û nerin.

VLADIMIR: Em tiştekî wilo nafikirin.

ESTRAGON: Em niha nafikirin.

POZZO: Saetçende?

ESTRAGON (// esmên dinêre): Ez binêrim...

VLADIMIR: Hefte?... Heşte?...

ESTRAGON: Li gorî demsalê tête guhertin.

POZZO: Ma şev e?

(Bêdengî. Vladimir û Estragon li avaçûyina rojê temaşe dikin.)

ESTRAGON: Tu dibêjî qey ew naçe ava, lê bilind dibe.

VLADIMIR: Ew bêîmkan e.

99

VLADIMIR: Ma te em nas nekirin?

POZZO: Ez kor im.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Belkî ew pêşerojê dibîne, ha?

VLADIMIR (Ji Pozzo re): Ji kengî ve?

POZZO: Çavên min gelekî saxlem bûn - lê gelo hûn dost in?

ESTRAGON (bi deng dikenin) Ew dipirse, ma em dost in!

VLADIMIR: Na, ew dixwaze bibêje, ma em dostên wî ne.

ESTRAGON: Wê çî bibe?

VLADIMIR: Jixwe wê bipirse. Me alîkariya wî kir.

ESTRAGON: Temam. Ma ku em ne dostên wî bûna, me ê ji ku alîkariya wî bikira?

VLADIMIR: Belkî.

ESTRAGON: Jixwe.

VLADIMIR: Em vê zêde tevnedin.

POZZO: Ma hûn ne rêbir in?

ESTRAGON: Rêbir? Kê dera me dişibe rêbiran?

VLADIMIR: Dev jê berde! Kor e.

ESTRAGON: Hela hela! Raste yaho. (Demek.)

POZZO: Min mehêlin û nerin.

VLADIMIR: Em tişteki wilo nafikirin.

ESTRAGON: Em niha nafikirin.

POZZO: Saetçende?

ESTRAGON (// esmên dinêre): Ez binêrim...

VLADIMIR: Hefte?... Heşte?...

ESTRAGON: Li gorî demsalê tête guhertin.

POZZO: Ma şev e?

(Bêdengî. Vladimir û Estragon li avaçûyina rojê temaşe dikin.)

ESTRAGON: Tu dibêji qey ew naçe ava, lê bilind dibe.

VLADIMIR: Ew bêimkan e.

99

ESTRAGON: Lê berbang be? --SIMV.V:.

VLADIMIR: Vala mepeyive. Ew der roava ye. ^ ? ' > ESTRAGON: Tu ji ku dizanî? ;M.i

POZZO (bi xemgînî): Ma bû êvar ? r\*/\*'. . . - . VLADIMIR: Qet ji cihê xwe jî tevnêliviya.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim ew bilind dibe.

POZZO: Ji bo çi hûn bersiva min nadin?

ESTRAGON: Ji ber ku em naxwazin derewan li te bikin.

VLADIMIR: (bi haşkirin): Dem êvar e, mîrza, em gihîştin êvarê. Dostê min dixwaze min têxe şikê; ez mikur têm ku ez kêliyê fikirîm min got gelo bi rastî weha ye. Lê ez bêsebeb vê roja dirêj nejiyam; û

baweriya te hebe wextî roj here ava. (Demek.) Ji derveyî vê, tu xwe çawan hîs dikî?

ESTRAGON: Em ê heta kengî vî mêrikî wilo hilgirin?

(Dikin wî berdin, lê gava têdigihên ku wê bikeve, dîsan pê digirin.) Ma em stûna avahiyê ne?

VLADIMIR: Ger min berî niha bi kêliyêkê şaş fêhm nekiribe, berê çavên te pir saxlem bûn, ma rast e?

POZZO: Erê, ji saxlem jî saxlemtir bû.

(Bêdengî.)

ESTRAGON (hêrs dibe): Fikra xwe berfireh bike, berfireh!

VLADIMIR: Meçe ser wî. Tu dibînî ku ew dilşahiya xwe bi bîr tîne. (Demek.) Meoria praeteritorum bonorum-divê pir zor be.

POZZO: Erê, pir baş bû.

VLADIMIR: Baş e, çavên te çawan wilo bûn, ez meraq dikim, gelo ji nişkê ve wilo bûn?

POZZO: Gava ez sibehekê şiyar bûm, qeder e, min xwe kor dît. (Demek.) Ez carna ji xwe dipirsim, gelo ma ez hê razayîme.

VLADIMIR: Ev kengî wilo bû?

100

ESTRAGON: Lê berbang be? --SIMV.V.:

VLADIMIR: Vala mepeyive. Ew der roava ye.^ ? ' > ESTRAGON: Tu ji ku dizanî? ;M.i

POZZO (bi xemgînî): Ma bû êvar ? r\*/\*'- . . . - . VLADIMIR: Qet ji cihê xwe jî tevnêliviya.

ESTRAGON: Ez ji te re dibêjim ew bilind dibe.

POZZO: Ji bo çi hûn bersiva min nadin?



ESTRAGON: Ji ber ku em naxwazin derewan li te bikin.

VLADIMIR: (bi haşkirin): Dem êvar e, mîrza, em gihîştin êvarê. Dostê min dixwaze min têxe şikê; ez mikur têm ku ez kêliyekê fikirîm min got gelo bi rastî weha ye. Lê ez bêsebeb vê roja dirêj nejiyam; û bawerîya te hebe wextî roj here ava. (Demek.) Ji derveyî vê, tu xwe çawan hîs dikî?

ESTRAGON: Em ê heta kengî vî mêrikî wilo hilgirin?

(Dikin wî berdin, lê gava têdigihên ku wê bikeve, dîsan pê digirin.) Ma em stûna avahiyê ne?

VLADIMIR: Ger min berî niha bi kêliyekê şaş fêhm nekiribe, berê çavên te pir saxlem bûn, ma rast e?

POZZO: Erê, ji saxlem jî saxlemtir bû.

(Bêdengî.)

ESTRAGON (hêrs dibe): Fikra xwe berfireh bike, berfireh!

VLADIMIR: Meçe ser wî. Tu dibînî ku ew dilşahiya xwe bi bîr tîne. (Demek.) Meoria praeteritorum bonorum-divê pir zor be.

POZZO: Erê, pir baş bû.

VLADIMIR: Baş e, çavên te çawan wilo bûn, ez meraq dikim, gelo ji nişkê ve wilo bûn?

POZZO: Gava ez sibehekê şiyar bûm, qeder e, min xwe kor dît. (Demek.) Ez carna ji xwe dipirsim, gelo ma ez hê razayîme.

VLADIMIR: Ev kengî wilo bû?

100

POZZO: Ez nizanim.

VLADIMIR: Lê ev ne berî do bûye...

POZZO: Min mehkeme mekin. Yê kor di derheqa demê de bi tiştê nizanin. (Demek.) Ew tiştên ku bi demê ve girêdayîne jî nabînin.

VLADIMIR: Bifikire! Min jî berevajiyê wê dizanîbû.

ESTRAGON: Ez diçim.

POZZO: Em li ku ne?

VLADIMIR: Ez nizanim.

POZZO: Gidî bila em ne li cihê bi navê La Planche bin?

VLADIMIR: Ez wir nizanim.

POZZO: Baş e, vir dişibe çi?

VLADIMIR (li dora xwe dinihêre): Mirov nikane salix bide.

Naşibe tiştê. Tiştêk tune. Darek heye.

POZZO: Wê çaxê ne La Planche e.

ESTRAGON (xwe ditewîne): Guhertin ancax evqas bibe.

POZZO: Xizmetkara min li ku ye?

VLADIMIR: Li vir e.

POZZO: Çima gava ez bang dikimê ew deng nake?

VLADIMIR: Ez nizanim. Mîna ku razayî ye. Belkî jî mirî ye.

POZZO: Tam çawan bû?

ESTRAGON: Tam?

VLADIMIR: Hûn herdu jî ketin.

POZZO: Ka lê binêre, ma ew birîndar bûye?

VLADIMIR: Em we bernadin ku?

POZZO: Pêwîst nake ku hûn herdu bi hev re pê bigirin.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Here binêre.

POZZO: Temam, bila dostê me here, taviê; evqas bêhneke genî tê ku wextî ez bêhiş bikevim.

VLADIMIR: Here, wî şiyar bike.

ESTRAGON: Piştî kirinên ku wî bi serê min de kirin? Ez bi-  
101

POZZO: Ez nizanim.

VLADIMIR: Lê ev ne berî do bûye...

POZZO: Min mehkeme mekin. Yê kor di derheqa demê  
de bi tiştêkî nizanin. (Demek.) Ew tiştên ku bi demê  
ve girêdayîne jî nabînin.

VLADIMIR: Bifikire! Min jî berevajiyê wê dizanîbû.

ESTRAGON: Ez diçim.

POZZO: Em li ku ne?

VLADIMIR: Ez nizanim.

POZZO: Gidî bila em ne li cihê bi navê La Planche bin?

VLADIMIR: Ez wir nizanim.

POZZO: Baş e, vir dişibe çi?

VLADIMIR (li dora xwe dinihêre): Mirov nikane salix bide.  
Naşibe tiştêkî. Tiştêk tune. Darek heye.

POZZO: Wê çaxê ne La Planche e.

ESTRAGON (xwe ditewîne): Guhertin ancax evqas bibe.

POZZO: Xizmetkara min li ku ye?

VLADIMIR: Li vir e.

POZZO: Çima gava ez bang dikimê ew deng nake?

VLADIMIR: Ez nizanim. Mîna ku razayî ye. Belkî jî mirî  
ye.

POZZO: Tam çawan bû?

ESTRAGON: Tam?

VLADIMIR: Hûn herdu jî ketin.

POZZO: Ka lê binêre, ma ew birîndar bûye?

VLADIMIR: Em we bernadin ku?

POZZO: Pêwîst nake ku hûn herdu bi hev re pê bigirin.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Here binêre.

POZZO: Temam, bila dostê me here, tavi lê; evqas bêhneke genî tê ku wextî ez bêhiş bikevim.

VLADIMIR: Here, wî şiyar bike.

ESTRAGON: Piştî kirinên ku wî bi serê min de kirin? Ez bi-  
101

mirim )i ez naçim.

VLADIMIR: Ha, dawî dawî hate bîra te ku wî tiştek bi te kiriye.

ESTRAGON: Tiştek nayê bîra min. Te bîska din behs kir.

VLADIMIR: rast e. (Ji Pozzo re.) Dostê min ditirse.

POZZO: Tiştekî ku mirov jê bitirse tune ye.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ka çî bi wan peyayên berî niha ku te dîtî, hat?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Belkî wan xwe li cihekî veşartine û li me dinêrin.

ESTRAGON: Wa me bêje.

VLADIMIR: Belkî jî bi tenê rawestiyane.

ESTRAGON: Wa.

VLADIMIR: Ji bo ku bêhna xwe berdî.

ESTRAGON: Ji bo ku hêza xwe bicivînin.

VLADIMIR: Belkî jî berepaş çûne.

ESTRAGON: Wa.

VLADIMIR: Belkî jî bi tenê xuyabûnek bû.

ESTRAGON: Xapandinek.

VLADIMIR: Xeyalek.

ESTRAGON: Xapandinek.

POZZO (Ji Estragon re): Tu li benda çi yî?

ESTRAGON: Ez li benda Godot me.

VLADIMIR (Ji Pozzo re): Min ji te re got ku dostê min tirsiyaye.

Do gava wî xwestiye hêsirên çavên xizmetkara  
te pakij bike, wê êrîşî wî kiriye.

POZZO: Divê mirov li hemberî mirovên wilo baş tevnegere,  
ew taviê hêrs dibin.

VLADIMIR: Baş e, bila ew çawan bike?

POZZO: Bila ew pêşî xwe bi ben ve bi dar ve bike, lê bila  
dîqet bike, bila ben wî nexeniqîne. Wê ev yeka

102

mirim )i ez naçim.

VLADIMIR: Ha, dawî dawî hate bîra te ku wî tiştekan bi te  
kiriye.

ESTRAGON: Tiştekan nayê bîra min. Te bîska din behs kir.

VLADIMIR: rast e. (Ji Pozzo re.) Dostê min ditirse.

POZZO: Tiştekanî ku mirov jê bitirse tuneye.

VLADIMIR (Ji Estragon re): Ka çi bi wan peyayên berî niha  
ku te dîtin, hat?

ESTRAGON: Ez nizanim.

VLADIMIR: Belkî wan xwe li cihekî veşartine û li me dinê-  
rin.

ESTRAGON: Wa me bêje.

VLADIMIR: Belkî jî bi tenê rawestiyane.

ESTRAGON: Wa.

VLADIMIR: Ji bo ku bêhna xwe berdîn.

ESTRAGON: Ji bo ku hêza xwe bicivînin.

VLADIMIR: Belkî jî berepaş çûne.

ESTRAGON: Wa.

VLADIMIR: Belkî jî bi tenê xuyabûnek bû.

ESTRAGON: Xapandinek.

VLADIMIR: Xeyalek.

ESTRAGON: Xapandinek.

POZZO (Ji Estragon re): Tu li benda çi yî?

ESTRAGON: Ez li benda Godot me.

VLADIMIR (Ji Pozzo re): Min ji te re got ku dostê min tirsiyaye.

Do gava wî xwestiye hêsirên çavên xizmetkara  
te pakij bike, wê êrîşî wî kiriye.

POZZO: Divê mirov li hemberî mirovên wilo baş tevnegere,  
ew tavlê hêrs dibin.

VLADIMIR: Baş e, bila ew çawan bike?

POZZO: Bila ew pêşî xwe bi ben ve bi dar ve bike, lê bila  
dîqet bike, bila ben wî nexeniqîne. Wê ev yeka  
102

han wî têxe hereketê. Ger ew nekeviyê bila heta jê  
were pehînan li zikê wî û li nava rûyê wî bixe.

ESTRAGON: Ger dest hilîne?

POZZO: Na, ew qet dest hilnayne.

VLADIMIR: Ez ê tavlê alîkariya wî bikim.

ESTRAGON: Çavên xwe ji min neqetine! (Ber bi Lucky ve  
diçe.)

VLADIMIR: Ka binêre bê ew dijî. Ger ew miribe, pêwîst  
nake ku tu lê bixî.

ESTRAGON (Bi ser Lucky ve tewiyaye.): Bêhna xwe dide û

distîne.

VLADIMIR: Wê çaxê, kincên wî lê bike.

(Estragon bi carekê ve mîna ku ji ziticîrê xelas bûbe, diqîre, dizûre û bi pehînan li Lucky dixê. Lê ew lingê xwe diêşîne, dikuie, dinaie û ji wir bi dûr dikeve. Lucky tê ser hişê xwe.)

ESTRAGON (// ser lingekî): Wey ker way!

(Estragon rûdine, dixwaze solên xwe ji lingên xwe derxe. Lê, gava ew piştî kurtedemekê têdigihê ku ew nikatte derxe, dev jê berdide, çongên xwe dikişîne zikê xwe, serê xwe dixê ttava çîmên xwe, milên xwe ii ser etiya xwe dide ser hev û rûdine.)

POZZO: Niha çi bû?

VLADIMIR: Dostê min tu êşand.

POZZO: Çi bû ji Lucky?

VLADIMIR: Ma ev ew e?

POZZO: Çawa?

VLADIMIR: Yanî ev Lucky ye?

POZZO: Ez fêhm nakim.

VLADIMIR: Ma tu jî Pozzo yî?

POZZO: Ji xwe ez Pozzo me.

VLADIMIR: Yanî eynî yên do ne?

103

han wî têxe hereketê. Ger ew nekeviyê bila heta jê were pehînan li zikê wî û li nava rûyê wî bixe.

ESTRAGON: Ger dest hilîne?

POZZO: Na, ew qet dest hilnayne.

VLADIMIR: Ez ê tavilê alîkariya wî bikim.

ESTRAGON: Çavên xwe ji min neqetine! (Ber bi Lucky ve diçe.)

VLADIMIR: Ka binêre bê ew dijî. Ger ew miribe, pêwîst nake ku tu lê bixî.

ESTRAGON (Bi ser Lucky ve tewiyaye.): Bêhna xwe dide û distîne.

VLADIMIR: Wê çaxê, kincên wî lê bike.

(Estragon bi carekê ve mîna ku ji ziticîrê xelas bûbe, diqîre, dizûre û bi pehînan li Lucky dixê. Lê ew lingê xwe diêşîne, dikuie, dinaie û ji wir bi dûr dikeve. Lucky tê ser hişê xwe.)

ESTRAGON (// ser lingekî): Wey ker way!

(Estragon rûdine, dixwaze solên xwe ji lingên xwe derxe. Lê, gava ew piştî kurtedemekê têdigihê ku ew nikatte derxe, dev jê berdide, çongên xwe dikişîne zikê xwe, serê xwe dixê ttava çîmên xwe, milên xwe ii ser etiya xwe dide ser hev û rûdine.)

POZZO: Niha çi bû?

VLADIMIR: Dostê min tu êşand.

POZZO: Çi bû ji Lucky?

VLADIMIR: Ma ev ew e?

POZZO: Çawa?

VLADIMIR: Yanî ev Lucky ye?

POZZO: Ez fêhm nakim.

VLADIMIR: Ma tu jî Pozzo yî?

POZZO: Ji xwe ez Pozzo me.

VLADIMIR: Yanî eynî yê do ne?

103



POZZO: Yê do?

VLADIMIR: Em do pêrgî hev hatin. (Bêdengî.) Ma nayê bîra te?

POZZO: Nayê bîra min ku ez do pêrgî hinan hatime. Lê wê sibe jî neyê bîra min ku ez îro pêrgî hinan hatime.

Ji bo bidestxistina malûmatan baweriya xwe bi min neyne. Evqas zimandirêjî jî bes e. Rabe ser xwe!

VLADIMIR: Ji bo firotinê te ew dibir Saint-Sauveurê. Hûn bi me re peyivîn. We dans kir.. Hûn fikirîn. Te pirr baş didît.

POZZO: Ger tu wilo dibêjî wilo ye. Ji kerema xwe re min berdin. (Vladimir ji ba Pozzo bi dûr dikeve.) Rabe ser xwe!

VLADIMIR: Radibe.

(Lucky radibe ser xwe û alavan dide hev.)

POZZO: Baş dike.

VLADIMIR: Hûn wilo diçine ku?

POZZO: Ev mijara han min eleqeder nake.

VLADIMIR: Tu çiqasî hatiyê guhertin!

(Lucky bar daye pişta xwe û hatiye li ber Pozzo rawestiyaye. )

VLADIMIR: Çi di baholê de heye?

POZZO: Qûm. (Xwe davêje ben.) Ber bi pêş ve! (Lucky jîndar dibe. Pozzo li dû wîye.)

VLADIMIR: Deqîqeyekê.

(Pozzo radiweste. Ben dişide. Lucky her tiştî berdide û dikeve xwarê. Pozzo dişewişe û ben tam di

wextê de berdide, lê Viadimir wî digire û nahêle bikeve.)

POZZO: Çi dibe?

VLADIMIR: Ket.

104

POZZO: Yê do?

VLADIMIR: Em do pêrgî hev hatin. (Bêdengî.) Ma nayê bîra te?

POZZO: Nayê bîra min ku ez do pêrgî hinan hatime. Lê wê sibe jî neyê bîra min ku ez îro pêrgî hinan hatime.

Ji bo bidestxistina malûmatan baweriya xwe bi min neyne. Evqas zimandirêjî jî bes e. Rabe ser xwe!

VLADIMIR: Ji bo firotinê te ew dibir Saint-Sauveurê. Hûn bi me re peyivîn. We dans kir.. Hûn fikirîn. Te pirr baş didît.

POZZO: Ger tu wilo dibêjî wilo ye. Ji kerema xwe re min berdîn. (Vladimir ji ba Pozzo bi dûr dikeve.) Rabe ser xwe!

VLADIMIR: Radibe.

(Lucky radibe ser xwe û alavan dide hev.)

POZZO: Baş dike.

VLADIMIR: Hûn wilo diçine ku?

POZZO: Ev mijara han min eleqeder nake.

VLADIMIR: Tu çiqasî hatiyê guhertin!

(Lucky bar daye piştî xwe û hatiye li ber Pozzo rawestiyaye. )

VLADIMIR: Çi di baholê de heye?

POZZO: Qûm. (Xwe davêje ben.) Ber bi pêş ve! (Lucky jîndar dibe. Pozzo li dû wîye.)

VLADIMIR: Deqîqeyekê.

(Pozzo radiweste. Ben dişide. Lucky her tiştî berdide û dikeve xwarê. Pozzo dişewiše û ben tam di wextê de berdide, lê Viadimir wî digire û nahêle bikeve.)

POZZO: Çi dibe?

VLADIMIR: Ket.

104

POZZO: Zûka, berî ku ew razê wî şiyar bike.

VLADIMIR: Ma ez te berdim tu nakevî?

POZZO: Ez bawer nakim.

(Viadimir diçe bi pehînan li Lucky dixê.)

VLADIMIR: Rabe ser xwe! Beraz! (Lucky radibe ser xwe û ftraxan dide hev.) Rabû ser xwe.

POZZO (destê xwe dirêj dike.): Ben!

(Lucky firaxan datîne, serê ben dixê destê Pozzo, dîsan radihêje firaxan.)

VLADIMIR: Êdî neçin.

POZZO: Ez diçim.

VLADIMIR: Gava hûn li cihekî ku kes nikanin alîkariya we bikin, dikevin, hûn çî dikin?

POZZO: Em li benda rabûna ser lingan radiwestin. Em paşê diçin.

VLADIMIR: Berî ku hûn herin jê re bibêje bila ji me re bistirê.

POZZO: Ez ji kê re bibêjim?

VLADIMIR: Ji Lucky re.

POZZO: Ma bila nestrê?

VLADIMIR: Erê. An jî fikirandina wî. An jî jiber xwendina wî.

POZZO: Baş e, lê ew lal e.

VLADIMIR: Lal e?

POZZO: Ji xwe. Ew nikane binale jî.

VLADIMIR: Lal e ha! Ji kengî ve?

POZZO (bi carekê ve ecêb hêrs dibe): Ma ne bes e ku we bi van çîrokên xwe yên demê roja min herimand?

Tiştêkî bêmane ye! Kengî! Kengî! Kengî be wê çaxê ye, rojek, ma ne bes e, rojeke ku dişibe yên din, ew lal bû, ez kor bûm, em ê rojekê jî kerr bibin, em rojekê çêbûne, em ê rojekê bimirin, eynî rojê,

105

POZZO: Zûka, berî ku ew razê wî şiyar bike.

VLADIMIR: Ma ez te berdim tu nakevî?

POZZO: Ez bawer nakim.

(Viadimir diçe bi pehînan li Lucky dixê.)

VLADIMIR: Rabe ser xwe! Beraz! (Lucky radibe ser xwe û ftraxan dide hev.) Rabû ser xwe.

POZZO (destê xwe dirêj dike.): Ben!

(Lucky firaxan datîne, serê ben dixê destê Pozzo, dîsan radihêje firaxan.)

VLADIMIR: Êdî neçin.

POZZO: Ez diçim.

VLADIMIR: Gava hûn li cihekî ku kes nikanin alîkariya we bikin, dikevin, hûn çi dikin?

POZZO: Em li benda rabûna ser lingan radiwestin. Em pa-

şê diçin.

VLADIMIR: Berî ku hûn herin jê re bibêje bila ji me re bistirê.

POZZO: Ez ji kê re bibêjim?

VLADIMIR: Ji Lucky re.

POZZO: Ma bila nestrê?

VLADIMIR: Erê. An jî fikirandina wî. An jî jiber xwendina wî.

POZZO: Baş e, lê ew lal e.

VLADIMIR: Lal e?

POZZO: Ji xwe. Ew nikane binale jî.

VLADIMIR: Lal e ha! Ji kengî ve?

POZZO (bi carekê ve ecêb hêrs dibe): Ma ne bes e ku we bi van çîrokên xwe yê demê roja min herimand?

Tiştêkî bêmane ye! Kengî! Kengî! Kengî be wê çaxê ye, rojek, ma ne bes e, rojeke ku dişibe yê din, ew lal bû, ez kor bûm, em ê rojekê jî kerr bibin, em rojekê çêbûne, em ê rojekê bimirin, eynî rojê,  
105

eynî mehê, ma ev ji me re ne bes d(Hê sakîntir)  
Jin di navbera dergûş û gorrê de dizên, roj hebekî rohnî dibe, paşê dîsan dibe şev. (Xwe bi ben ve digire.)  
Ber bi pêş ve!

(Derdikevin. Vladimir heta bi kulîsê li dû wan diçe, paşê ji pişt ve li wan dinihêre. Dengê ketinekê nîşan dide ku ew dîsan dikevin xwarê. Bêdengî.  
Vladimir ber bi Estragonê ku radizê ve diçe, demekê li wî temaşe dike, paşê wîşiyar dike. )

ESTRAGON (Pişfî ku hereketên ecêb dike û gotinên bêmane

dibêje): Tu çima her tim min şiyar dikî?

VLADIMIR: Ez xwe bi tenê hîs dikim.

ESTRAGON: Ez di xewna xwe de xwe dilşa dibînim.

VLADIMIR: Wan kirin ku dem derbas bibe.

ESTRAGON: Min di xewna xwe de...

VLADIMIR: Bibirre! (Bêdengî.) Ez bi rastî meraq dikim bê ew bi rastî kor e.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Ma korekî rastîn dibêje ku dem tune ye?

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Pozzo.

ESTRAGON: Ma kor bûye?

VLADIMIR: Wî got ya.

ESTRAGON: Baş e çi bûye?

VLADIMIR: Bi min wilo hat ku mîna ku wî em didîtin.

ESTRAGON: Te xewn dîtiye. (Demek.) Em ji vir herin. Em nikanin herin. Rast e. (Demek.) Ma tu êmin î ku ew ne ew e. VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Godot!

VLADIMIR: Lê, ma kî?

106

eynî mehê, ma ev ji me re ne bes d(Hê sakîntir)

Jin di navbera dergûş û gorrê de dizên, roj hebekî

rohnî dibe, paşê dîsan dibe şev. (Xwe bi ben ve digire.)

Ber bi pêş ve!

(Derdikevin. Vladimir heta bi kulîsê li dû wan di-

çe, paşê ji pişt ve li wan dinihêre. Dengê ketinekê

nîşan dide ku ew dîsan dikevin xwarê. Bêdengî.

Vladimir ber bi Estragonê ku radizê ve diçe, demekê li wî temaşe dike, paşê wîşiyar dike. )

ESTRAGON (Pişfî ku hereketên ecêb dike û gotinên bêmane dibêje): Tu çima her tim min şiyar dikî?

VLADIMIR: Ez xwe bi tenê hîs dikim.

ESTRAGON: Ez di xewna xwe de xwe dilşa dibînim.

VLADIMIR: Wan kirin ku dem derbas bibe.

ESTRAGON: Min di xewna xwe de...

VLADIMIR: Bibirre! (Bêdengî.) Ez bi rastî meraq dikim bê ew bi rastî kor e.

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Ma korekî rastîn dibêje ku dem tune?

ESTRAGON: Kî?

VLADIMIR: Pozzo.

ESTRAGON: Ma kor bûye?

VLADIMIR: Wî got ya.

ESTRAGON: Baş e çi bûye?

VLADIMIR: Bi min wilo hat ku mîna ku wî em didîtin.

ESTRAGON: Te xewn dîtiye. (Demek.) Em ji vir herin. Em nikanin herin. Rast e. (Demek.) Ma tu êmin î ku ew ne ew e. VLADIMIR: Kî?

ESTRAGON: Godot!

VLADIMIR: Lê, ma kî?

106

ESTRAGON: Pozzo.

VLADIMIR: Çi munasebet! Çi munasebet! (Demek.) Çi munasebet!

ESTRAGON: Çi dibe bila bibe ez ê rabim ser xwe. (Bi zorê

radibe ser xwe.) Ay!

VLADIMIR: Ez êdî nizanim ez ê li çî bifikirim.

ESTRAGON: Lingên min! (Rûdine, dixwaze solên xwe ji lingên xwe derxe.) Alîkariya min bike!

VLADIMIR: Gelo ma gava yên din êş dikişandin ez razayîbûm? Gava ez sibehê texmîn bikim ku ez şiyar bûme, gelo ez ê ji bo îro çî bibêjim? Ma ez ê texmîn bikim ku ez bi dostê xwe Estragon re heta bûye şev em li vir li benda Godot mane? An jî derbasbûna Pozzo û barkêşê wî ya di vir re û bi me re peyivandina wî? Bêguman. Lê ji van hemûyan ya rast kîjan e? (Gava Estragon hewl daye bêsebeb soiên xwe ji lingên xwe derxhte dîsan di xew re çûye. Vladimir li wî dittêre.) Wê haya wî ji tiştêkî çênebe. Ew ê behsa lêdanên pehînan ku li wî hatine kirin, bike, ez ê jî gêzerekî bidimê. (Demek.) Lîngêkî wî di gorrê de ye, lîngê din jî di zayîneke zehmet de. Di binê kortalê de gorrevan bi kêfa xwe hesinê xwe tê re derbas dike. Dema mirovî ya ku pîr bibe namîne. Hewa bi qêrînên me ve tijî ye. (Guhdarî dike.) Lê hînbûyin bêdengîkirineke mezin e. (L/ Estragon dinêre.) Hinek li min jî dinerin, dibêjin, ew razaye, ew nizane ku ew razaye, bihêle bila ew razê. (Demek.) Min çî got? (Bi heyecan diçe û tê, dawî dawî li nêzîkî kulîsa li milê çepê radiweste, li dûr dinêre. Ji milê rastê lawikê ku berî bi rojekê li ba wan bû, tê. Radiweste. Bêdengî.)



ESTRAGON: Pozzo.

VLADIMIR: Çi munasebet! Çi munasebet! (Demek.) Çi munasebet!

ESTRAGON: Çi dibe bila bibe ez ê rabim ser xwe. (Bi zorê radibe ser xwe.) Ay!

VLADIMIR: Ez êdî nizanim ez ê li çi bifikirim.

ESTRAGON: Lingên min! (Rûdine, dixwaze solên xwe ji lingên xwe derxe.) Alîkariya min bike!

VLADIMIR: Gelo ma gava yên din êş dikişandin ez razayîbûm? Gava ez sibehê texmîn bikim ku ez şiyar bûme, gelo ez ê ji bo îro çi bibêjim? Ma ez ê texmîn bikim ku ez bi dostê xwe Estragon re heta bûye şev em li vir li benda Godot mane? An jî derbasbûna Pozzo û barkêşê wî ya di vir re û bi me re peyivandina wî? Bêguman. Lê ji van hemûyan ya rast kîjan e? (Gava Estragon hewl daye bêsebeb soiên xwe ji lingên xwe derxhte dîsan di xew re çûye. Vladimir li wî dîtêre.) Wê haya wî ji tiştêkî çênebe. Ew ê behsa lêdanên pehînan ku li wî hatine kirin, bike, ez ê jî gêzerekî bidimê. (Demek.)

Lingekî wî di gorrê de ye, lingê din jî di zayineke zehmet de. Di binê kortalê de gorre van bi kêfa xwe hesinê xwe tê re derbas dike. Dema mirovî ya ku pîr bibe namîne. Hewa bi qêrînên me ve tijî ye. (Guhdarî dike.) Lê hînbûyin bêdengîkirineke mezin e. (L/ Estragon dinêre.) Hinek li min jî dinerin, dibêjin, ew razaye, ew nizane ku ew razaye, bihêle

bila ew razê. (Demek.) Min çî got?

(Bi heyecan diçe û tê, dawî dawî li nêzîkî kulîsa li milê çepê radiweste, li dûr dinêre. Ji milê rastê lawîkê ku berî bi rojekê li ba wan bû, tê. Radiweste. Bêdengî.)

107

LAWIK: Mîrza... (Vladimir bi paş ve dizîvire.) Mîrza Albert...

VLADIMIR: Em ji serî ve dest pê bikin. (Demek. Ji lêwik re) Ma te ez nas nekirim?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma yê ku do hat ne tu bû?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ev cara pêşî ye ku tu tê vir?

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Mîrza Godot tu şandiye.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ew ê îşev bikanibe were.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Lê wê sibe were.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ji sedî sed.

LAWIK: Erê, Mîrza.

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma tu di rê de pêrgî kesî nehat?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Du însanên (dudilîdibe) ...wekî din?

LAWIK: Min qet kes nedît, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Mîrza Godot çi karî dike? (Demek.) Ma dengê min tê te?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Wê çaxê?

LAWIK: Tişteki nake, Mîrza?

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Birayê te çawa ye?

108

LAWIK: Mîrza... (Vladimir bi paş ve dizîvire.) Mîrza Albert...

VLADIMIR: Em ji serî ve dest pê bikin. (Demek. Ji lêwik re) Ma te ez nas nekirim?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma yê ku do hat ne tu bû?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Ma ev cara pêşî ye ku tu tê vir?

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Mîrza Godot tu şandiye.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ew ê îşev bikanibe were.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Lê wê sibe were.

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Ji sedî sed.

LAWIK: Erê, Mîrza.

LAWIK: Erê, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma tu di rê de pêrgî kesî nehat?

LAWIK: Na, Mîrza.

VLADIMIR: Du însanên (dudilîdibe) ...wekî din?

LAWIK: Min qet kes nedît, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Mîrza Godot çi karî dike? (Demek.) Ma dengê min tê te?

LAWIK: Erê, Mîrza.

VLADIMIR: Wê çaxê?

LAWIK: Tiştêkî nake, Mîrza?

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Birayê te çawa ye?

108

LAWIK: Nexweş e, Mîrza.

VLADIMIR: Dibe ku jî yê ku do hat ew bû.

LAWIK: Ez nizanim, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma riha Mîrza Godot heye?

LAWIK: Heye, Mîrza.

VLADIMIR: Mazer e... (dudilî dibe.) ...reşe?

LAWIK (bi dudilîbûn): Ez bawer im spî ye, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Xwedêyo!

(Bêdengî.)

LAWIK: Ez ji Mîrza Godot re çi bibêjim, Mîrza?

VLADIMIR: Ji wî re bibêje ku -(radiweste)- jê re bibêje ku te ez dîtîme û -(diftkire)- jê re bibêje te ez dîtîme.

(Demek. Vladimir ber bi îewik ve dimeşe, iawik berepaş ve diçe, Viadimir radiweste, lawik jî radiweste.)

Bibêje, ma tu ji dîtina min êmin î ne wilo,  
tu ê sibehê nebêjî ku te ez qet nedîtîme, ne wilo?

(Bêdengî. Viadimir bi carekê ve hol dibe pêş, iawik mîna tîrekê baz dide. Bêdengî. Hîv diçe ava, ro derdikeve. Viadimir bêhereket dimîne. Estragon şiyar dibe, solên xwe ji iingên xwe derdixe, radibe ser xwe, solên di destên xwe de tîne datîne pêş rampê, ber bi Vladimir ve diçe, ii wîdinêre.)

ESTRAGON: Çi bûye?

VLADIMIR: Tiştêk nebûye.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Ez jî.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma ji mêj ve ye ez radizêm?

VLADIMIR: Ez nizamim.

(Bêdengî.)

109

LAWIK: Nexweş e, Mîrza.

VLADIMIR: Dibe ku jî yê ku do hat ew bû.

LAWIK: Ez nizamim, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Ma riha Mîrza Godot heye?

LAWIK: Heye, Mîrza.

VLADIMIR: Mazer e... (dudilî dibe.) ...reşe?

LAWIK (bi dudilîbûn): Ez bawer im spî ye, Mîrza.

(Bêdengî.)

VLADIMIR: Xwedêyo!

(Bêdengî.)

LAWIK: Ez ji Mîrza Godot re çi bibêjim, Mîrza?

VLADIMIR: Ji wî re bibêje ku -(radiweste)- jê re bibêje ku te ez dîtîme û -(diftkire)- jê re bibêje te ez dîtîme.

(Demek. Vladimir ber bi îewik ve dimeşe, iawik berepaş ve diçe, Viadimir radiweste, lawik jî radiweste.)

Bibêje, ma tu ji dîtîna min êmin î ne wilo, tu ê sibehê nebêjî ku te ez qet nedîtîme, ne wilo?

(Bêdengî. Viadimir bi carekê ve hol dibe pêş, iawik mîna tîrekê baz dide. Bêdengî. Hîv diçe ava, ro derdikeve. Viadimir bêhereket dimîne. Estragon şiyar dibe, solên xwe ji iingên xwe derdixe, radibe ser xwe, solên di destên xwe de tîne datîne pêş rampê, ber bi Vladimir ve diçe, ii wîdinêre.)

ESTRAGON: Çi bûye?

VLADIMIR: Tiştêk nebûye.

ESTRAGON: Ez diçim.

VLADIMIR: Ez jî.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma ji mêj ve ye ez radizêm?

VLADIMIR: Ez nizamim.

(Bêdengî.)

109

ESTRAGON: Em ê herin ku?

VLADIMIR: Em dûr naçin.

ESTRAGON: Na, na, em herin cihekî dûrî vir!

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Divê em sibehê werin.

ESTRAGON: Jiboçi?

VLADIMIR: Ji bo ku em li benda Godot bimînin.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Ma ew nehatiye?

VLADIMIR: Nehatiye.

ESTRAGON: Wext jî pir dereng e niha.

VLADIMIR: Erê, bûye şev.

ESTRAGON: Tu çi dibêjî, ma em dev jê berdin. (Demek.)

Ma em dev jê berdin? Ha?

VLADIMIR: Wê me ceze bike. (Bêdengî. Li darê dittêre.) Bi tenê dar dijî.

ESTRAGON (// darê dinêre): Ev çi ye?

VLADIMIR: Dar e.

ESTRAGON: Erê, lê dara çi ye.

VLADIMIR: Ez nizanim. Bîh e.

ESTRAGON: Ka were vir. (Vladimir ber bi darê ve dibe. Li ber darê bêhereket radiwestin. Bêdengî.) Ma em xwe bi dar ve bikin?

VLADIMIR: Bi çi?

ESTRAGON: Ma benê te tune ye?

VLADIMIR: Tune ye.

ESTRAGON: Wê çaxê çênabe.

VLADIMIR: Em ji vir herin.

ESTRAGON: Raweste, qayîşa min heye.

VLADIMIR: Ew pîrr kin e.

ESTRAGON: Tu min ji lingan ve bi dar ve bike.

VLADIMIR: Baş e, wê kî min bi dar ve bike?

110

ESTRAGON: Em ê herin ku?

VLADIMIR: Em dûr naçin.

ESTRAGON: Na, na, em herin cihekî dûrî vir!

VLADIMIR: Em nikanin herin.

ESTRAGON: Çima?

VLADIMIR: Divê em sibehê werin.

ESTRAGON: Jiboçi?

VLADIMIR: Ji bo ku em li benda Godot bimînin.

ESTRAGON: Rast e. (Demek.) Ma ew nehatiye?

VLADIMIR: Nehatiye.

ESTRAGON: Wext jî pir dereng e niha.

VLADIMIR: Erê, bûye şev.

ESTRAGON: Tu çi dibêjî, ma em dev jê berdîn. (Demek.)

Ma em dev jê berdîn? Ha?

VLADIMIR: Wê me ceze bike. (Bêdengî. Li darê dittêre.) Bi tenê dar dijî.

ESTRAGON (// darê dinêre): Ev çi ye?

VLADIMIR: Dar e.

ESTRAGON: Erê, lê dara çi ye.

VLADIMIR: Ez nizanim. Bîh e.

ESTRAGON: Ka were vir. (Vladimir ber bi darê ve dibe. Li ber darê bêhereket radiwestin. Bêdengî.) Ma em xwe bi dar ve bikin?

VLADIMIR: Bi çi?

ESTRAGON: Ma benê te tune ye?

VLADIMIR: Tune ye.

ESTRAGON: Wê çaxê çênabe.



VLADIMIR: Em ji vir herin.

ESTRAGON: Raweste, qayışa min heye.

VLADIMIR: Ew pırr kin e.

ESTRAGON: Tu min ji lıngan ve bi dar ve bike.

VLADIMIR: Baş e, wê kî min bi dar ve bike?

110

ESTRAGON: Raste.

VLADIMIR: Ka bide min. (Estragon benê ku bi niyeta qayı-  
şê dabû pişt a xwe, derdixê. Pantorê wî yê pırr fireh  
dikeve ser lingên wî. Li ben dinerin.) Ne ku  
qet nabe. Lê ma gelo zexim e?

ESTRAGON: Em ê bibînin. Bigire.

(Her yek bi seriyekî ben digirin û dikişînin. Ben  
diqete. Ew kirî bikevin.)

VLADIMIR: Pênc pere nake.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma divê em sibe werin vir?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Wê çaxê em ê benekî zexim bînin.

VLADIMIR: Çêdibe.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Didi.

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ez êdî nikanim wilo dom bikim.

VLADIMIR: Her wilo tête gotin.

ESTRAGON: Ma em ji hev veqetin? Belkî baştir bibe.

VLADIMIR: Em ê sibehê xwe bi dar ve bikin. (Demek.)

Ger Godot neyê.

ESTRAGON: Û ger ew were.

VLADIMIR: Em ê xelas bibin.

(Vladimir şewqeyê xwe ji serê xwe dike -ev şewqeyê Lucky ye- li hundurê wî dinihêre, destê xwe di hundurê wî de dibe û tîne, dawdişîne û dide serêxwe.)

ESTRAGON: Em herin?

VLADIMIR: Pantorê xwe li xwe bike.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Pantorê xwe li xwe bike.

111

ESTRAGON Raste.

VLADIMIR: Ka bide min. (Estragon benê ku bi niyeta qayişê dabû pişta xwe, derdixe. Pantorê wî yê pirr fireh dikeve ser lingên wî. Li ben dinerin.) Ne ku qet nabe. Lê ma gelo zexim e?

ESTRAGON: Em ê bibînin. Bigire.

(Her yek bi seriyekê ben digirin û dikişînin. Ben diqete. Ew kirê bikevin.)

VLADIMIR: Pênc pere nake.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Ma divê em sibe werin vir?

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Wê çaxê em ê benekê zexim bînin.

VLADIMIR: Çêdibe.

(Bêdengî.)

ESTRAGON: Didi.

VLADIMIR: Erê.

ESTRAGON: Ez êdî nikanim wilo dom bikim.

VLADIMIR: Her wilo tête gotin.

ESTRAGON: Ma em ji hev veqetin? Belkî baştir bibe.

VLADIMIR: Em ê sibehê xwe bi dar ve bikin. (Demek.)

Ger Godot neyê.

ESTRAGON: Û ger ew were.

VLADIMIR: Em ê xelas bibin.

(Vladimir şewqeyê xwe ji serê xwe dike -ev şewqeyê

Lucky ye- li hundurê wî dinihêre, destê xwe

di hundurê wî de dibe û tîne, dawdişîne û dide serêxwe.)

ESTRAGON: Em herin?

VLADIMIR: Pantorê xwe li xwe bike.

ESTRAGON: Çi?

VLADIMIR: Pantorê xwe li xwe bike.

111

ESTRAGON: Ez pantorê xwe ji xwe bikim?

VLADIMIR: Pantorê xwe LI XWE BIKE.

ESTRAGON: Rast e. (Ew pantorê xwe dikişîne xwe. Bêdengt.)

VLADIMIR: Ma em herin?

ESTRAGON: Em herin.

(Ji cihên xwe tevnalivin.)

Perde

112

ESTRAGON: Ez pantorê xwe ji xwe bikim?

VLADIMIR: Pantorê xwe LI XWE BIKE.

ESTRAGON: Rast e. (Ew pantorê xwe dikişîne xwe. Bêdengt.)

VLADIMIR: Ma em herin?

ESTRAGON: Em herin.

(Ji cihên xwe tevnalivin.)

Perde

112

\*\*

## LI MALA MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN

(Diyalog)

Jirat Ciiviri

NÛDEM

LI MALA MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN

(Diyalog)

Jirat Ciiviri

NÛDEM

Weşanên NÛDEM 41 Li mala tnîr Celadet Alî Bedir-Xan

Stockliolm: 1998

© Wejanên NÛDEM

Pergala bergê û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Portreyê Celadet

Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri

ISBN: 91 88591-41 3 Box 177

177 23 jSrfalla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

8-580 131 62

Me piraniya fotografên Celadet Bedir-Xan ji ba Mahmûd Lewendî  
peyda

kirine, em gelekî spasî wî dikin.

Weşanên NÛDEM 41 Li mala tnîr Celadet Alî Bedir-Xan

Stockliolm: 1998

© Wejanên NÛDEM

Pergala bergê û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Portreyê Celadet

Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri

ISBN: 91 88591-41 3 Box 177

177 23 jSrfalla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

8-580 131 62

Me piraniya fotografên Celadet Bedir-Xan ji ba Mahmûd Lewendî  
peyda

kirine, em gelekî spasî wî dikin.

Ji roja ku min navê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan bihîstiye  
û Hawara wî xwendiyê, ew li ber dilê min şêrîn û li ber  
çavên min mezin bûye. Hebûna wî kêfa min aniye û fikrên  
wî ji min re bûne rêber. Xurtî û kapasîteya entelektueliya  
wî ew nefsbîçûk kiriye, nefsbîçûkiya wî ji wî re bûye mezinahî  
û bi xêra mezinahiya wî ye ku ern îro li hêjahiyên xwe  
xwedî derdikevin. Ji ber ku wî bi xebat û nivîsên xwe hêjahiyên  
me bi qîmet kirine, behsa edeb û dîroka me kiriye û  
cihekî mezin û giranbuha daye çand û edebiyata me.  
Min biharekê haziriya xwe kir, çenteyek tije kinc û alavên  
ku ji bo rêwîtiyê ji min re lazim bûn, amade kir, ji bo  
hevpeyvînan teybeke biçûk digel deh kasetan xist çenteyekî  
û min ji Swêdê berê xwe da Sûriyê. Min xwest ez herim  
mala Celadet Bedir-Xan. Min dixwest ez li mala wî bigerim,  
bi dotmama wî re li ser wî sohbet bikim, fikir û ramanên  
wî hê baştir nas bikim, çîroka wî ji devê dotmam û kevaniya  
wî bibihîzim. Ez hê di balafirê de bûm kelecaneke  
ez girtibûm, lê gava min ji Şamê xwe bi otobusê gihand  
Baniyasê û min li deriyê Rewşen Xanimê kire teqînî, di şû-

na heyecanê de dilşahiyekê di dilê min de pêl da.  
Rewşen Xanim ji hundur pêrgî min hat û ez hemêz kirim.  
Germahiya hemêza wê hemêzkirina diya min ku min  
deh salan nedîtibû, anî bîra min û wê jî bi hesreta hemêzki  
roja ku min navê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan bihîstiye  
û Hawara wî xwendiyê, ew li ber dilê min şêrîn û li ber  
çavên min mezin bûye. Hebûna wî kêfa min aniye û fikrên  
wî ji min re bûne rêber. Xurtî û kapasîteya entelektueliya  
wî ew nefsbîçûk kiriye, nefsbîçûkiya wî ji wî re bûye mezinahî  
û bi xêra mezinahiya wî ye ku ern îro li hêjahiyên xwe  
xwedî derdikevin. Ji ber ku wî bi xebat û nivîsên xwe hêjahiyên  
me bi qîmet kirine, behsa edeb û dîroka me kiriye û  
cihekî mezin û giranbûha daye çand û edebiyata me.  
Min biharekê haziriya xwe kir, çenteyek tije kinc û alavên  
ku ji bo rêwîtiyê ji min re lazim bûn, amade kir, ji bo  
hevpeyvînan teybeke biçûk digel deh kasetan xist çenteyekî  
û min ji Swêdê berê xwe da Sûriyê. Min xwest ez herim  
mala Celadet Bedir-Xan. Min dixwest ez li mala wî bigerim,  
bi dotmama wî re li ser wî sohbet bikim, fikir û ramanên  
wî hê baştir nas bikim, çîroka wî ji devê dotmam û kevaniya  
wî bibihîzim. Ez hê di balafirê de bûm kelecaneke  
ez girtibûm, lê gava min ji Şamê xwe bi otobusê gihand  
Baniyasê û min li deriyê Rewşen Xanimê kire teqînî, di şû-  
na heyecanê de dilşahiyekê di dilê min de pêl da.  
Rewşen Xanim ji hundur pêrgî min hat û ez hemêz kirim.  
Germahiya hemêza wê hemêzkirina diya min ku min  
deh salan nedîtibû, anî bîra min û wê jî bi hesreta hemêzki-  
rina kurê xwe ez şidandim. Em derbasî hundur bûn. Gava

min xwest ez pêlavên xwe ji pê bikim, wê nehişt û xwest ku ez tevî pêlavan derbasî ser xalîçeyên raxistî bibim. Taviê hat bîra min ku ew kultureke fransî ye. Em rûniştin, hema piştî" rûniştinê wê cigare îkramî min kir, min cigareke wê pêxist û li hal û wextê wê pirsî. Wê jî li rewşa me û li xebatên me yên li Ewropayê pirsî. Wê gelekî kêfa xwe ji nivîsandina bi kurdî re anî û di bîra min de anî ku divê em hînî xebata bi hev re bibin. Wê gotina xwe ya ku carekê di Hawarê de nivîsandibû dubare kir: "Hûn yekîtiya kurdan bidin min, ez ê Kurdistanê serbixwe bidim we". Min heq da wê. Gava çaya me hat, min çavên xwe li hundurê odeyê gerandin. Dîwar, bi resimên çarçovekirî yên malbata Bedir-Xaniyan ve xemilandî bûn. Resimên hersê biran: Sureya, Kamran û Celadet Alî Bedir-Xan di ser serê me re bû. Li milê din resimekî bavê Rewşen Xanimê Salih Bedir-Xan, ode dadigirt. Li quncika odeyê, kitêbxaneyek camînî ku kitêbên tê de baş dixuyan hebû. Kursî û maseyên destpêka sedsalan nozdehan hewayeke arîstokrasiya fransî dixiste hundur. Lê xaliyên rengîn û bi neqşên kurdî yên ku dîwana odê nixumandibû, hewayek klasîsma kurdî tevî ya fransî dikir. Li ser maseya me jî çend rojnameyên erebî û du-sê pirtûk hebûn. Wê rojê heta bi derengê êvarê, di ser şivê de û heta bi derengê şevê jî me li ser rewşa dinyayê, rewşa kurdan, dema Celadet, derxistina Hawarê, nivîskarên Hawarê, problemên çap û belavkirina Hawarê û rewşa xwendevanan sohbet kir.

Êdî şerma min nemabû, Rewşen Xanimê jî ez mîna endarina kurê xwe ez şidandim. Em derbasî hundur bûn. Gava

min xwest ez pêlavên xwe ji pê bikim, wê nehişt û xwest ku ez tevî pêlavan derbasî ser xalîçeyên raxistî bibim. Taviê hat bîra min ku ew kultureke fransî ye. Em rûniştin, hema piştî" rûniştinê wê cigare îkramî min kir, min cigareke wê pêxist û li hal û wextê wê pirsî. Wê jî li rewşa me û li xebatên me yên li Ewropayê pirsî. Wê gelekî kêfa xwe ji nivîsandina bi kurdî re anî û di bîra min de anî ku divê em hînî xebata bi hev re bibin. Wê gotina xwe ya ku carekê di Hawarê de nivîsandibû dubare kir: "Hûn yekîtiya kurdan bidin min, ez ê Kurdistanê serbixwe bidim we". Min heq da wê. Gava çaya me hat, min çavên xwe li hundurê odeyê gerandin. Dîwar, bi resimên çarçovekirî yên malbata Bedir-Xaniyan ve xemilandî bûn. Resimên hersê biran: Sureya, Kamran û Celadet Alî Bedir-Xan di ser serê me re bû. Li milê din resimekî bavê Rewşen Xanimê Salih Bedir-Xan, ode dadigirt. Li quncika odeyê, kitêbxaneyek camînî ku kitêbên tê de baş dixuyan hebû. Kursî û maseyên destpêka sedsalan nozdehan hewayeke arîstokrasiya fransî dixiste hundur. Lê xaliyên rengîn û bi neqşên kurdî yên ku dîwana odê nixumandibû, hewayek klasîsma kurdî tevî ya fransî dikir. Li ser maseya me jî çend rojnameyên erebî û du-sê pirtûk hebûn. Wê rojê heta bi derengê êvarê, di ser şivê de û heta bi derengê şevê jî me li ser rewşa dinyayê, rewşa kurdan, dema Celadet, derxistina Hawarê, nivîskarên Hawarê, problemên çap û belavkirina Hawarê û rewşa xwendevanan sohbet kir.

Êdî şerma min nemabû, Rewşen Xanimê jî ez mîna endamêkî malê dihesiband û wê tewra wê dikir ku ez jî xwe mî-



na endamekî malê bihesibînim. Min di wê navê re tavi lê benda Celadet Alî Bedir-Xan "Were Dotmam" ya ku ji bo Rewşen Xanimê nivîsandibû di bîra wê de anî û bîranînên wê yê ciwaniyê teze kirin. "Erê, erê..." wê jî bi axîn got, "wî ne bi tenê bi hesreta pismamekî ez hemêz dikirim, lê bi ya bavekî, bi ya birayekî jî ez hemêz dikirim. Ew mêrê min, bavê min, birayê min bû..." Min dît ku Rewşen Xanim di xeyalan de kûr diçe û dixwaze

bi her awayî Celadetê xwe bi bîr bîne, wî di bîranînê xwe de zindî bike. Hema di wê navê re, ew rabû ser xwe, çû ji wê kitêbxaneyê camînî du albumên mezin anîn û li ser masê danîn. Wê pêşî rahişt albuma Celadet û kursiya xwe nêzîkî min kir û xwest resim bi resim ji min re behs bike. Wê ez di wê albuma mezin de derxistim rêwîtiyeke dîrokî. Êdî ez ji dema niho bi dûr ketibûm û ketibûm dema borî. Nayê bîra min bê ez kengî û çawan ketim nav nivînan û çawan di xew re çûm.

Me albumek qedandibû û me êdî li albuma dudan dinêrî. Di nivê albuma dudan de dengê kuxukekê ji ber derî hat. Min ji Rewşen Xanimê pirsar mewanê bêwext kir, wê got, apê te Celadet e.

mekî malê dihesiband û wê tewra wê fikir ku ez jî xwe mîna endamekî malê bihesibînim. Min di wê navê re tavi lê benda Celadet Alî Bedir-Xan "Were Dotmam" ya ku ji bo Rewşen Xanimê nivîsandibû di bîra wê de anî û bîranînên wê yê ciwaniyê teze kirin. "Erê, erê..." wê jî bi axîn got, "wî ne bi tenê bi hesreta pismamekî ez hemêz dikirim, lê bi ya bavekî, bi ya birayekî jî ez hemêz dikirim. Ew mêrê

min, bavê min, birayê min bû... " Min dît ku Rewşen Xanim di xeyalan de kûr diçe û dixwaze

bi her awayî Celadetê xwe bi bîr bîne, wî di bîranînê xwe de zindî bike. Hema di wê navê re, ew rabû ser xwe, çû ji wê kitêbxaneyê camînî du albumên mezin anîn û li ser masê danîn. Wê pêşî rahişt albuma Celadet û kursiya xwe nêzîkî min kir û xwest resim bi resim ji min re behs bike. Wê ez di wê albuma mezin de derxistim rêwîtiyeke dîrokî. Êdî ez ji dema niho bi dûr ketibûm û ketibûm dema borî. Nayê bîra min bê ez kengî û çawan ketim nav nivînan û çawan di xew re çûm.

Me albumek qedandibû û me êdî li albuma dudan dinêrî. Di nivê albuma dudan de dengê kuxukekê ji ber derî hat. Min ji Rewşen Xanimê pirsê mêvanê bêwext kir, wê got, apê te Celadet e.

Mîr Celadet derbasî hundurê odeya me bû û bi devkenî got: - Wey mêvanê delal, tu bi xêr hatiyî!

Min albuma di destên xwe de danî ser masê û ez rabûm ser xwe ku herim destê wî, lê wî nehişt û em çûn rûyên hev. Paşê wî destê xwe yê rastê danî ser milê min û ji min xwest ku ez li cihê xwe rûnê. Ez rûniştim. Wî jî çakê xwe yê reş li ser piştê kursiyê bi cih kir û li kêleka min rûnişt. Ji kincên wî dixuya ku ew ji şahiyekê dihat. Êlegê gewr, gomlekê spî û qerewata belek pir lê hatibû. Simbêlê wî û riha wî ya li ser çengê sivik bû. Bi dostanî destê xwe avêt ser milê min û bi germî got:

Min bihîstiye ko te daye ser riya Hawarê û te Hawar ji nû ve çap kiriye. Te bi vê yeka ha pir kêfa min anî, Xwedê emrê

te dirêj bike. Ji xwe min Hawar ji bo we derdixist, şikir ji Xwedê re ko hûn bi hebûna wê hesiyane. Êdî ez ê bi rehetî di gorê de binivim.

Gava cigare pêxist, ji bo ku dixana wî bi ser min de neyê, ji kêleka min rabû û li ser qoltixa hemberî min rûnişt. Min jî tavilê kasetek xist teyba xwe ya biçûk û xwe ji pirsan re amadekir. Min dixwest ez bi wî re li ser her tiştî bipeyivim. Min jê pirsî:

Mîr Celadet derbasî hundurê odeya me bû û bi devkenî got: - Wey mêvanê delal, tu bi xêr hatiyî!

Min albuma di destên xwe de danî ser masê û ez rabûm ser xwe ku herim destê wî, lê wî nehişt û em çûn rûyên hev. Paşê wî destê xwe yê rastê danî ser milê min û ji min xwest ku ez li cihê xwe rûnê. Ez rûniştim. Wî jî çakêtê xwe yê reş li ser piştta kursiyê bi cih kir û li kêleka min rûnişt. Ji kincên wî dixuya ku ew ji şahiyekê dihat. Êlegê gewr, gomlekê spî û qerewata belek pir lê hatibû. Simbêlê wî û riha wî ya li ser çengê sivik bû. Bi dostanî destê xwe avêt ser milê min û bi germî got:

Min bihîstiyê ko te daye ser riya Hawarê û te Hawar ji nû ve çap kiriye. Te bi vê yeka ha pir kêfa min anî, Xwedê emrê te dirêj bike. Ji xwe min Hawar ji bo we derdixist, şikir ji Xwedê re ko hûn bi hebûna wê hesiyane. Êdî ez ê bi rehetî di gorê de binivim.

Gava cigare pêxist, ji bo ku dixana wî bi ser min de neyê, ji kêleka min rabû û li ser qoltixa hemberî min rûnişt. Min jî tavilê kasetek xist teyba xwe ya biçûk û xwe ji pirsan re amadekir. Min dixwest ez bi wî re li ser her tiştî bipeyivim. Min jê

pirsî:

9

FIRATCEWERÎ: Gava birayê te Bedir-Xan dimire, rehmetiyê bavê te ji bo wî loriyekê dinivîsîne. Bi rastî jî ew siîra bavê te êgir berdide dilê mirov, mirov pir xemgîn dike.

Min ê bixwesta ku tu ji me re wê şîrê bixwînî, lê ez naxwazim derdên te tev bidim, bîranînên ne xweş zindî bikim, ez dixwazim tu hebekî behsa dê û bavê xwe û malbata xwe bikî. Tu bikaribî ji kerema xwe re pêşî bi çend gotinan kalikê xwe Bedir-Xan bi me bidî naskirin wê bas bibe.

MÎR CELAOET ALÎ BEDIR-XAN: Ew Bedir-Xanê ko ji bona yekîtiya Kurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tiştên xwe di vê reyê de feda kiriye û ji bona wê jî miriye.

Bavê te Emîn Alî jî dabû ser şopa bavê xwe, wî jî ji bo Kurdistanê şer û pevçûn kiriye. Gelo tu ê bavê xwe çawan bidî naskirin?

Ev bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên bakurî honik dibû û di Cizîrê de di nav germiya lat û zinarên Burca-belek de dikeliha, û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji sîngên dahatiyên malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayên wan vedimîzt -lê ez bi dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê rêya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.

10

FIRATCEWERÎ: Gava birayê te Bedir-Xan dimire, rehmetiyê bavê te ji bo wî loriyekê dinivîsîne. Bi rastî jî ew siîra bavê

te êgir berdide dilê mirov, mirov pir xemgîn dike.

Min ê bixwesta ku tu ji me re wê şîrê bixwînî, lê ez naxwazim derdên te tev bidim, bîranînên ne xweş zindî bikim, ez dixwazim tu hebekî behsa dê û bavê xwe û malbata xwe bikî. Tu bikaribî ji kerema xwe re pêşî bi çend gotinan kalikê xwe Bedir-Xan bi me bidî naskirin wê bas bibe.

MÎR CELAOET ALÎ BEDIR-XAN: Ew Bedir-Xanê ko ji bona yekîtiya Kurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tiştên xwe di vê reyê de feda kiriye û ji bona wê jî miriye.

Bavê te Emîn Alî jî dabû ser şopa bavê xwe, wî jî ji bo Kurdistanê şer û pevçûn kiriye. Gelo tu ê bavê xwe çawan bidî naskirin?

Ev bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên bakurî honik dibû û di Cizîrê de di nav germiya lat û zinarên Burca-belek de dikeliha, û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji sîngên dahatiyên malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayên wan vedimîzt -lê ez bi dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê rêya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.

10

Digel ku diya te bi eslê xwe çerkez e jî, lê ew dîsan bi her awayî bi kurdîtiyê ve girêdayî bû. Ew ji kurdekê kurdtir bû. Tê gotin ku gava tu ê biketa dibistana herbiyê ew aciz bûbû, nexwestibû tu têkevî artêsa tirkan. Ma rast e? Ev dêya ko gava ez hejdeh, nwazdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba herbiyê, ji min re goti bû: "Ma ji te re

ne namûs e? Tuê çawan bikevî mekteba herbiyê û bibî zabitê tirkî. Ev tirkî ko welatê te ji destê te standine, milletê te xistine xulamiyê, bapîrê te perîşan kirine û hon avêtine zîvariye . Mamoste, bi rastî jî navê malbata te û herweha rola malbata te di dîroka siyasî û rewsenbîriya kurdî de mezin e. Lê malbata te ya mezin û navdar, ji aliyê karbidestên osmaniyan û pasê jî ji aliyê Mustafa Kemal ve gelek tade û neheqî dîtîye. Tu bi xwe jî bûyî şahidê vê neheqiyê û te gelek ês û azar kişandiye. Bi taybetî jî gava di sala 1922an de tu û birayê xwe mamoste Kamran çûn Almaniyayê û li ba kekê xwe Safder bi cih bûn. Pistî wê bi kurtedemekê krîzeke mezin li Almaniyayê dest pê kir û digel krîza li Almaniyayê, trajediya malbata te, tu li Almaniyayê perîşan kiribû. Rews weha bûbû ku ji bo tu bikariba bijiya, te kincên xwe firotibûn. Lê te xwend, tu ji zanistê bi dûr neketî û tu her li pêseroja xwe difîkirî. Tu ya rastî bixwazî, tu ji pêşeroja xwe bêtir, li pêseroja kurdan û welatê wan difîkirî. Te hilwesandina malbata xwe, li Almaniyayê mirina kekê xwe Safder û li Misrê jî mirina bavê xwe

ii

Digel ku diya te bi eslê xwe çerkez e jî, lê ew dîsan bi her awayî bi kurdîtiyê ve girêdayî bû. Ew ji kurdekê kurdîr bû. Tê gotin ku gava tu ê biketa dibistana herbiyê ew aciz bûbû, nexwestibû tu têkevî artêsa tirkan. Ma rast e? Ev dêya ko gava ez hejdeh, nêzdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba herbiyê, ji min re goti bû: "Ma ji te re ne namûs e? Tuê çawan bikevî mekteba herbiyê û bibî zabitê tirkî. Ev tirkî ko welatê te ji destê te standine, milletê te xistine

xulamîyê, bapîrê te perîşan kirine û hon avêtine zîvariye  
. Mamoste, bi rastî jî navê malbata te û herweha rola malbata  
te di dîroka siyasî û rewsenbîriya kurdî de mezin e.  
Lê malbata te ya mezin û navdar, ji aliyê karbidestên osmaniyan  
û pasê jî ji aliyê Mustefa Kemal ve gelek tade û  
neheqî dîtiye. Tu bi xwe jî bûyî şahidê vê neheqiyê û te  
gelek ês û azar kişandiye. Bi taybetî jî gava di sala 1922an  
de tu û birayê xwe mamoste Kamran çûn Almaniyayê û li  
ba kekê xwe Safder bi cih bûn. Pistî wê bi kurtedemekê  
krîzeke mezin li Almaniyayê dest pê kir û digel krîza li  
Almaniyayê, trajediya malbata te, tu li Almaniyayê perîşan  
kiribû. Rews weha bûbû ku ji bo tu bikariba bijiya, te  
kincên xwe firotibûn. Lê te xwend, tu ji zanistê bi dûr  
neketî û tu her li pêseroja xwe difîkirî. Tu ya rastî bixwazî,  
tu ji pêşeroja xwe bêtir, li pêseroja kurdan û welatê  
wan difîkirî. Te hilwesandina malbata xwe, li Almaniyayê  
mirina kekê xwe Safder û li Misrê jî mirina bavê xwe  
ii

Emîn Alî û te têkçûna çend serîhildanên Kurdistanê dît.  
Te tevgerên siyasî ava kir, tu bû serok jî, lê te pasê bi carekê  
ve destê xwe ji siyaseta partîtiyê kişand û te xwe bi  
hemû hêza xwe avêt meydana çand, ziman û edebiyata  
kurdî. Di eynî demê de, te dest bi wesandina kovarekê  
kir û te navê kovara xwe jî kire HAWAR. Gelo Hawar çi  
ye?

Hawar dengê zanîne ye.

Zanîn çi ye?

Zanîn xwe nasîn e.

Xwenasîn?...

Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.

Wê karê Hawara we yê pêşî çî be?

Hawara me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide nas kirin.

Çima?

Lewma ko ziman sêta heyinê a pêşîn e.

\

12

Emîn Alî û te têkçûna çend serhildanên Kurdistanê dît.

Te tevgerên siyasî ava kir, tu bû serok jî, lê te pasê bi carekê

ve destê xwe ji siyaseta partîtiyê kişand û te xwe bi

hemû hêza xwe avêt meydana çand, ziman û edebiyata

kurdî. Di eynî demê de, te dest bi wesandina kovarekê

kir û te navê kovara xwe jî kire HAWAR. Gelo Hawar çî

ye?

Hawar dengê zanîne ye.

Zanîn çî ye?

Zanîn xwe nasîn e.

Xwenasîn?...

Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.

Wê karê Hawara we yê pêşî çî be?

Hawara me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide nas kirin.

Çima?

Lewma ko ziman sêta heyinê a pêşîn e.

\

12



Gelo mirov dikare bibêje ku Hawar kovareke edebî û çandî ye, ew bi siyasetê mijûl nabe?

Hawarê siyaset ji civatên welatî re histiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin.

Tu dikarî ji kerema xwe re behsa awayê xebata xwe bikî?

Karekî ko bikare biçe serî, divêt jê re pronivîsek bêt çêkirin.

We pronivîsa xwe li ser kîjan bingehê lêkiriye?

Me pronivîsa xwe li ser vî bingehê jêrîn lêkiriye.

Tu dikarî ji kerema xwe re niqte bi niqte ji me re behs bikî?

i) Belavkirina elfabêya kurdî di nav kurdan û hînkirina wê. Senifandina zimanzanîna kurdî û hin bi hin di komelê de belav kirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêxistin.

2) Sehîtiya zarên kurdî û berhevdanîna wan. Sehîti ser mirovatiya zimanê kurdî digel zimanên din ên arî. Sehîti ser bingehên zimanê kurdî, ser dîrok û awayê rabûn û pêşveketina wî.

3) Ber hevkirina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranên kurdî û birêve belavkirina wan.

4) Senifandin û belavkirina dîwanên kurdî. Bi van ve jînenigariyên şair û mirovên bijarte jî dê bînin belav kirin.

13

Gelo mirov dikare bibêje ku Hawar kovareke edebî û çandî ye, ew bi siyasetê mijûl nabe?

Hawarê siyaset ji civatên welatî re histiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin.

Tu dikarî ji kerema xwe re behsa awayê xebata xwe bikî?

Karekî ko bikare biçe serî, divêt jê re pronivîsek bêt çêkirin.

We pronivîsa xwe li ser kîjan bingehê lêkiriye?

Me pronivîsa xwe li ser vî bingehê jêrîn lêkiriye.

Tu dikarî ji kerema xwe re niqte bi niqte ji me re behs bikî?

i) Belavkirina elfabêya kurdî di nav kurdan û hînkirina wê.

Senifandina zimanzanîna kurdî û hin bi hin di komelê de belav kirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêxistin.

2) Sehîtiya zarên kurdî û berhevdanîna wan. Sehîti ser mirovatiya zimanê kurdî digel zimanên din ên arî. Sehîti ser bingehên zimanê kurdî, ser dîrok û awayê rabûn û pêşveketina wî.

3) Ber hevkirina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranên kurdî û birêve belavkirina wan.

4) Senifandin û belavkirina dîwanên kurdî. Bi van ve jînenigariyên şair û mirovên bijarte jî dê bên belav kirin.

13

5) Sehîti ser reqs û qeydeyên stranên kurdî.

6) Sehîti ser her texlît rêzikên kurdî û Kurdistanê, yên zemanê borî û yên îrû û senifandina wan. Sehîti ser hatinên Kurdistanê û piş û sinhetên kurdî.

7) Dîrok û erdnîgarî:

Sehîti ser tevayiya dîrok û erdnîgariya welatê Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî, paşî û di wextê Mîr-Şeref de.

Spas ji bo van agahdariyan. Bi rastî jî we karekî mezin daye ber xwe. Bi a min ya herî girîng jî we tradisyona tirkî-kurdî, an jî tenê bi tirkî sikandiye û hûn kovara xwe bi kurdî derdixin. Ev tiştêkî pîroz e. Nizanim, carinan hin der û dor dibêjin ku zimanê kurdî têra siyaseta û edebiyatê

nake. Gelo cenabê te çiqasî bi kurdî dizane?

Zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zimanên din daniye ber hev, kitkitên wî hûrhûnandine; qeydeyên wî ji hev derêxsitine, dikarim ji biyaniyan bêtir û qenctir derheqa wî de bidim xuya kirin û zanîn.

Lê mamoste, divê em mikur werin ku zimanê me di her warî de bi pêş neketiye. Helbet sebebên vê hene. Kurd di dema nêzîk de nebûne dewlet, zimanê wan serbest nebûye; nebûye zimanê ilm û ticaretê, nebûye zimanê felsefê û bajarvaniyê; loma ew cih bi cih teng maye. An jî di hin waran de teng, di hin waran de jî fireh e. Gelo cenabê te dikare vê yekê hebekî şirove bike. Zimanê kurdî çima teng maye, an jî di ku de fireh e?

14

5) Sehîti ser reqs û qeydeyên stranên kurdî.

6) Sehîti ser her texlît rêzikên kurdî û Kurdistanê, yên zemanê borî û yên îrû û senifandina wan. Sehîti ser hatinên Kurdistanê û piş û sinhetên kurdî.

7) Dîrok û erdnîgarî:

Sehîti ser tevayiya dîrok û erdnîgariya welatê Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî, paşî û di wextê Mîr-Şeref de.

Spas ji bo van agahdariyan. Bi rastî jî we karekî mezin daye ber xwe. Bi a min ya herî girîng jî we tradisyona tirkî-kurdî, an jî tenê bi tirkî sikandiye û hûn kovara xwe bi kurdî derdixin. Ev tiştêkî pîroz e. Nizanim, carinan hin der û dor dibêjin ku zimanê kurdî têra siyaseta û edebiyatê nake. Gelo cenabê te çiqasî bi kurdî dizane?

Zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zimanên

din daniye ber hev, kitkitên wî hûrhûnandine; qeydeyên wî ji hev derêxsitine, dikarim ji biyaniyan bêtir û qenctir derheqa wî de bidim xuya kirin û zanîn.

Lê mamoste, divê em mikur werin ku zimanê me di her warî de bi pêş neketiye. Helbet sebebên vê hene. Kurd di dema nêzîk de nebûne dewlet, zimanê wan serbest nebûye; nebûye zimanê ilm û ticaretê, nebûye zimanê felsefê û bajarvaniyê; loma ew cih bi cih teng maye. An jî di hin waran de teng, di hin waran de jî fireh e. Gelo cenabê te dikare vê yekê hebekî şirove bike. Zimanê kurdî çima teng maye, an jî di ku de fireh e?

14

Zimanê me îro hem fireh hem teng e.

Fireh e: Bi her tiştê ko kurd pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî warî de zimanê kurdî hing zimanên din û ji hinan bê-tir pêş ve çûye, û kemiliye, û ji tii zimanên kemilî bi şûn de ne maye.

Teng e: Herçî ko ji kurdan re nenas mane û kurd pê mijûl ne bûne, di wî warî de zimanê me rawestiyaye, pêş.ve ne çûye, di cihê xwe de maye.

Lê zimanê me ji wan zimanan e ko pirsên nuh dizên û birêve pirsên nuh ji wan çar dibin.

Min fêhm nekir mamoste, bi çi awayî? . . . , Herwekî xelkê Geliyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin. Ji lewra ko ji banî ji bala difire. Dîsan kurdmancên ko tîlefona dîtin, ji mesmeha wê re bihîstok gotin. Ji ber ko deng pê têt bihîstin.

Bi rastî wisa ye mamoste. Niha tistekî nû derketiye ku

cenabê te nedîtiye. Kurdan ji xwe ber nav lêkirine. Jê re dibêjin "telefona desta". Herçî swêdî ne dibêjin "MobU telefon", tirk dibêjin "Cep telefonu". Alman jî mîna kurdan dibêjin "Handy", ew jî tê maneya "telefona desta".

Ez dixwazim tu hebekî jî behsa awayê nivîsandina zimanê kurdî bikî?

Îrû di zimanê me de du texlît kêmanî hene: winda bûna pirsinen kurdî û ketina pirsinen biyanî nav zmên.

15

Zimanê me îro hem fireh hem teng e.

Fireh e: Bi her tiştê ko kurd pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî warî de zimanê kurdî hing zimanên din û ji hinan bê-tir pêş ve çûye, û kemiliye, û ji tii zimanên kemilî bi şûn de ne maye.

Teng e: Herçî ko ji kurdan re nenas mane û kurd pê mijûl ne bûne, di wî warî de zimanê me rawestiyaye, pêş.ve ne çûye, di cihê xwe de maye.

Lê zimanê me ji wan zimanan e ko pirsên nuh dizên û birêve pirsên nuh ji wan çar dibin.

Min fêhm nekir mamoste, bi çi awayî? . . . , Herwekî xelkê Geliyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare

dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin. Ji lewra ko ji banî ji bala difire. Dîsan kurdmancên ko tîlefon dîtin, ji mesmeha wê re bihîstok gotin. Ji ber ko deng pê têt bihîstin.

Bi rastî wisa ye mamoste. Niha tistekî nû derketiye ku cenabê te nedîtiye. Kurdan ji xwe ber nav lêkirine. Jê re dibêjin "telefona desta". Herçî swêdî ne dibêjin "MobU telefon", tirk dibêjin "Cep telefonu". Alman jî mîna kurdan

dibêjin "Handy", ew jî tê maneya "telefona dest".

Ez dixwazim tu hebekî jî behsa awayê nivîsandina zimanê kurdî bikî?

Îrû di zimanê me de du texlît kêmanî hene: wînda bûna pirsînen kurdî û ketîna pirsînen biyanî nav zman.

15

Em çawan dikarin zimanê kurdî ê paqij bi kar bînin?

Di wînda bûna pirsan de, pirsînen hene ko yekcar wînda bûne, hin hene ji zerekî ketîne lê di zerekî din de dijîn û çendek hene di axaftîna de kêmanî tene gotîna lê di mamîk, medhelok, çîrok û stranan de tene bîhîstîna.

Em li pey wan in, hin bi hin em wan diêxin dest û disenîffînîna û gora mehcetê jî ji nuh ve ser awayê hevedudanîna pirsên kurdî pirsînen nuh çêdîkin.

Mîna cenabê te jî pê dizane, di dema nûjen de zimanê kurdî di warê nivîskî de zêde nehatiye bikaranîn. Loma dibê ku zimanê nivîskî ji bo xwendevanên kurd hebekî zehmet be. Gelo ji bo pesveçûna zimanê çî xebatên we hene? Ji bona pesveçûna zimanê, divê em bendên xwe bi tevayîya van pirsan bîntvîsînîna û li paşîya her hejmarê ferhengokê danîna û tê de mana pirsên ko di zaran de kêmanî bûne û yê ko ji nuh ve hatîna hevedudanîna ji xwendevanên xwe re bidîna zanîn. Ez dixwazim disan vegerim ser Hawarê. Ez meraq dikim gelo wê Hawar ji çiqasî carekê derkeve?

Di destpêkê de komela me di panzdeh rûjan de carekê dê derkeve. Piştî çend hejmaran komela me dê bibe hefteyê û li serê her hefteyê dê belav bibe.

16

Em çawan dikarin zimanê kurdî ê paqij bi kar bînin?  
Di winda bûna pirsan de, pirsin hene ko yekcar winda bûne,  
hin hene ji zarekî ketine lê di zarekî din de dijîn û çendek  
hene di axaftinê de kêmtêne gotin lê di mamik, medhelok,  
çîrok û stranên de têne bihîstin.

Em li pey wan in, hin bi hin em wan diêxin dest û disenifînin  
û gora mehçetê jî ji nuh ve ser awayê hevedudanîna  
pîrsên kurdî pîrsînen nuh çêdikin.

Mîna cenabê te jî pê dizane, di dema nûjen de zimanê  
kurdî di warê niviskî de zêde nehatiye bikaranîn. Loma  
dibe ku zimanê nivîsê ji bo xwendevanên kurd hebekî  
zehmet be. Gelo ji bo pesveçûna zimên çî xebatên we hene?  
Ji bona pêşveçûna zimên, divê em bendên xwe bi tevayîya  
van pirsan bintvîsînin û li paşîya her hejmarê ferhengokê danin  
û tê de mana pîrsên ko di zaran de kêmtêne û yê ko ji  
nuh ve hatine hevedudanîn ji xwendevanên xwe re bidin zanîn.  
Ez dixwazim disan vegerim ser Hawarê. Ez meraq dikim  
gelo wê Hawar ji çiqasî carekê derkeve?

Di destpêkê de komela me di panzdeh rûjan de carekê dê  
derkeve. Piştî çend hejmaran komela me dê bibe hefteyî û li  
serê her hefteyê dê belav bibe.

16

Lê di jiyana Hawarê de tarîxên cida hene. Li gora ku diviyabû  
derketa derneketiye, bi derengî ketiye an jî demekê  
hatiye rawestandî. Gelo tu dikarî ji kerema xwe re ji  
me re behsa van tarîxên cida û sebebên rawestandîna  
Hawarê bikî?

Di jiyana Hawarê de sê tarîxên bîrawer hene. . . Tarîxa pêşîn: 15 Gulan 1932. Di vê tarîxê de gazî û hawara kurdan ji dil û devê wan ketine nav xêz û xêzikên çend rûpelan û kovareke kurdî anîne pê. Ji kurdan re Hawar, Hawareke nû, Hawara zanîn û danzanîne za.

Tistê ez dizanim heta wê tarîxê kurd ji alfabeyê yekgirtî bêpar bûn, an jî di bin nîrên alfabeyên serdestan de bûn. Gelo ev tarîxa i<sup>ê</sup> Gulanê ji bo kurdmancan tê çi maneyê?

Ev roj di jiyana kurdmancan a civakî û edebî de rojêke tarixî ye. Di vê rojê de kurdmanc bûn xwediyê elfabêke biserxwe, elfabêke kurdî û ji nîrê elfabiyên milletên din, milletên biyanî xelas bûn.

Tu dikarî alfabeyekê ji bo milletekî çawan tarîf bikî? Alfabe çi ye?

Elfabê alek e, ala biserxwebûna heyîna me a edebî ye.

Berê di ser keleha me a edebî re alên biyaniyan li ba dibûn.

Di vê rojê de kurdmancan ew al daxistin, çirandin û li şûna 17

Lê di jiyana Hawarê de tarîxên cida hene. Li gora ku diviyabû derketa derneketiye, bi derengî ketiye an jî demekê hatiye rawestandî. Gelo tu dikarî ji kerema xwe re ji me re behsa van tarîxên cida û sebebên rawestandîna Hawarê bikî?

Di jiyana Hawarê de sê tarîxên bîrawer hene. . . Tarîxa pêşîn: 15 Gulan 1932. Di vê tarîxê de gazî û hawara kurdan ji dil û devê wan ketine nav xêz û xêzikên çend rûpelan û kovareke kurdî anîne pê. Ji kurdan re Hawar, Hawareke



nû, Hawara zanîn û danzanînê za.

Tistê ez dizanim heta wê tarîxê kurd ji alfabeyêke yekgirtî bêpar bûn, an jî di bin nîrên alfabeyên serdestan de bûn. Gelo ev tarîxa î^ê Gulanê ji bo kurdmancan tê çi maneyê?

Ev roj di jiyana kurdmancan a civakî û edebî de rojeke tarixî ye. Di vê rojê de kurdmanc bûn xwediyê elfabêke biserxwe, elfabêke kurdî û ji nîrê elfabiyên milletên din, milletên biyanî xelas bûn.

Tu dikarî alfabeyekê ji bo miletekî çawan tarîf bikî? Alfabe çi ye?

Elfabê alek e, ala biserxwebûna heyîna me a edebî ye.

Berê di ser keleha me a edebî re alên biyaniyan li ba dibûn.

Di vê rojê de kurdmancan ew al daxistin, çirandin û li şûna

17

18

wan ala xwe a milî daçikandin û ji hêsîriya wan bandêran filitîn, xwe dan ber siha bandêra xwe û di vê qadê de bûne bi- serxwe.

Min di derekê de xwendibû ku tu di sala işiyan de li ser alfabeyekê dixebitî. Gelo ew alfaba ku tu behs dikî eynî alfabe ye?

Belê, elfabêya ko ji sala hezar û neh sed û iiozdehan ve ez lê dixebitîm, min ew di wê rojê de, di rûpelên Hawarê de belav kir.

Em dizanin digel ku bi kurdî dihate peyivandin, pê an nedihat nivîsandin, an jî pir kêr dihate nivîsandin. Yê ku pê dinivîsandin jî mele û feqehên ku di medreseyan de xwendibûn û mîna cenabê te jî pê dizane wan jî alfabeya

erebî bi kar dianîn, yanî bi tîpên erebî dinivîsandin.

Gelo di demeke weha de alfabeya te bi kêr hat? Pê koyar  
û kitêb derketin?

Kurdmancên ko pê hesiyan û hînî wê bûne îro zimanê xwe  
bi alfabiya xwe a milî û bê tu dişwariyê dinivîsînin û kovar  
û kitêbên ko ketine çapê bi kêfxweşî dixwînin.

Lê Hawarê gelek dom ne kir. Hejmara wê a bîst û şeşan di  
i8ê Tebaxa i93jan de belav bû û ji hingê ve Hawar nema  
derket.

Lê hîmê xwendin û nivîsandinê, elfabê belav bûbû û piştî  
razandina Hawarê jî gelek û hergav nebin jî carcara hin kitêb  
19

wan ala xwe a milî daçikandin û ji hêsîriya wan bandêran filitîn,  
xwe dan ber siha bandêra xwe û di vê qadê de bûne bi- serxwe.  
Min di derekê de xwendibû ku tu di sala işiyan de li ser  
alfabeyekê dixebitî. Gelo ew alfaba ku tu behs dikî eynî  
alfabe ye?

Belê, elfabêya ko ji sala hezar û neh sed û iiozdehan ve ez lê  
dixebitîm, min ew di wê rojê de, di rûpelên Hawarê de belav  
kir.

Em dizanin digel ku bi kurdî dihate peyivandin, pê an  
nedihat nivîsandin, an jî pir kêr dihate nivîsandin. Yê  
ku pê dinivîsandin jî mele û feqehên ku di medreseyan  
de xwendibûn û mîna cenabê te jî pê dizane wan jî alfabeya  
erebî bi kar dianîn, yanî bi tîpên erebî dinivîsandin.

Gelo di demeke weha de alfabeya te bi kêr hat? Pê koyar  
û kitêb derketin?

Kurdmancên ko pê hesiyan û hînî wê bûne îro zimanê xwe

bi alfabiya xwe a milî û bêî tu dişwariyê dinivîsînî û kovar  
û kitêbên ko ketine çapê bi kêfxweşî dixwînin.

Lê Hawarê gelek dom ne kir. Hejmara wê a bîst û şeşan di  
i8ê Tebaxa i93jan de belav bû û ji hingê ve Hawar nema  
derket.

Lê hîmê xwendin û nivîsandinê, elfabê belav bûbû û piştî  
razandina Hawarê jî gelek û hergav nebin jî carcara hin kitêb  
19

diketin çapê û digihan destê kurdmancan.

Di wan salan de ji kurdên ko bîrewerê heyina xwe ne û di  
dilê wan de rûmeta millet û welêt heye bi hînbûna xwendin  
û nivîsandina zimanê xwe xebitîn û zanîna xwe pêş ve birin.  
Ew ne bi tenê xebitîn û elimîn, lê xebitandin û elimandin jî.  
Belê ew ji vî milletê bêdibistan re bûne dibistan, dersa welatîyên  
xwe gotin û ew gihandin; ji wan mirovên nezan mirovine  
xwenda anîne pê.

Lê belê gava ku mirov li hejmara kesên ku bi xwendin û  
nivîsandina zimanê kurdî ve mijûl in dinêre, mirov dibî-  
ne ku hejmara wan gelekî kême. Herçiqas cenabê te dibêje  
ku ji wan mirovên nezan mirovine xwende hatibin  
pê jî, bi ya min hejmara wan mirovên xwende ku cenabê  
te bi lêv dike jî, pir kême. Bi raya min ger xwende û zana,  
dewlemend û siyasetvan dest biavêjin bikaranîna zimanê  
kurdî hingê wê pirsgirêka zimanê kurdî jî zû çareser  
bibe. Mîna cenabe te jî pê dizane, hinek hene di civatan  
de li ser ziman û edebiyata kurdî dorê nadin kesî, lê  
gava dor tê ser wan, mirov dibîne ku ew bi xwe guh nadin  
zimanê kurdî, ew bi xwe bi kurdî nawxînin û nanivî-

sînin û herweha ew zarokên xwe jî hînê kurdî nakin. Gelo nêrîna te di vê derheqê de çi ye?

Yên ko xwe, bi gotinê, kurdên qenc û welatparêz dihesibînin wextê xwe bi kurt û pistên pûç û vala derbas kirin û ji lewre hêj (e) û (ê) ji hev fêrç nakin. Lê ew bi zimanê biyaniyan û hinekê wan bi çendekan dizanin û hin hene ko di wan zima- xo diketin çapê û digihan destê kurdmancan.

Di wan salan de ji kurdên ko bîrewerê heyina xwe ne û di dilê wan de rûmeta millet û welêt heye bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê xwe xebitîn û zanîna xwe pêş ve birin. Ew ne bi tenê xebitîn û elimîn, lê xebitandin û elimandin jî. Belê ew ji vî milletê bêdibistan re bûne dibistan, dersa welatîyên xwe gotin û ew gihandin; ji wan mirovên nezan mirovine xwenda anîne pê.

Lê belê gava ku mirov li hejmara kesên ku bi xwendin û nivîsandina zimanê kurdî ve mijûl in dinêre, mirov dibîne ku hejmara wan gelekî kêr e. Herçiqas cenabê te dibêje ku ji wan mirovên nezan mirovine xwende hatibin pê jî, bi ya min hejmara wan mirovên xwende ku cenabê te bi lêv dike jî, pir kêr e. Bi raya min ger xwende û zana, dewlemend û siyasetvan dest biavêjin bikaranîna zimanê kurdî hingê wê pirsgirêka zimanê kurdî jî zû çareser bibe. Mîna cenabe te jî pê dizane, hinek hene di civatan de li ser ziman û edebiyata kurdî dorê nadin kesî, lê gava dor tê ser wan, mirov dibîne ku ew bi xwe guh nadin zimanê kurdî, ew bi xwe bi kurdî nawxînin û nanivî- sînin û herweha ew zarokên xwe jî hînê kurdî nakin. Gelo nêrîna te di vê derheqê de çi ye?

Yên ko xwe, bi gotinê, kurdên qenc û welatparêz dihesibînin wextê xwe bi kurt û pistên pûç û vala derbas kirin û ji lewre hêj (e) û (ê) ji hev fêrî nakin. Lê ew bi zimanê biyaniyan û hinekê wan bi çendekan dizanin û hin hene ko di wan zima- xon de xwende û zanayine xurt in jî. Lê bi zimanê xwe ê mader, bi vî zimanê şêrîn û delel, bi zimanê da û dapîr, bi zarê kal û kalikên xwe nizanin.

Ji xwe ez jî vê fêhm nakim. Ew sibehê heta êvarê qala bindestiya kurdan dikin, qala qedexebûna li ser zimanê kurdî dikin, qala kultura kurdan dikin, lê ew bi xwe hewl nadin ku bi zimanê kurdî bipeyivin, bi kultura kurdî perwerde bibin û di rabûn û rûnistina gelek ji wan de heyranîya biyaniyan heye. Mamoste, carinan bi min wisa tê ku ew ji ber ziman, kultur û rabûn û rûniştina milletê xwe serm dikin; ji ya xelkê hez dikin. Ger ne wisa bûya, diviyabû wan berî her tistî, li her derê, bi înad zimanê xwe bi kar bianîna. Tu ji mirovên welê re çî dibêj»

Mirov dibêje qey ew ji bin hikmê bandêra biyaniyan naxwazin derkevin û hêsîrî bi wan şêrîn e. Heke welê ye, divêt rayekî biyaniyan di wan geriya be. Rakî welê ko bi dizîka bi wan ve bûye. Herwekî şairê sorî gotiye:

Her kesî kurd naseraw bî hez be bonî kurd ne ka  
Pirsiyarî daye ley ka ta le babî xoy biga  
Belê ew bi zimanê xwe ê mader nizanin.

Dibe ku jî zimanê wan ê mader, yanî kurdî giran be, zehmet be, loma ew nikarin wisa zû hîn bibin. Tu di vê

nan de xwende û zanayine xurt in jî. Lê bi zimanê xwe ê mader,  
bi vî zimanê şêrîn û delel, bi zimanê da û dapîr, bi zarê  
kal û kalikên xwe nizanin.

Ji xwe ez jî vê fêhm nakim. Ew sibehê heta êvarê qala  
bindestiya kurdan dikin, qala qedexebûna li ser zimanê  
kurdî dikin, qala kultura kurdan dikin, lê ew bi xwe  
hewl nadin ku bi zimanê kurdî bipeyivin, bi kultura  
kurdî perwerde bibin û di rabûn û rûnistina gelean ji  
wan de heyraniya biyaniyan heye. Mamoste, carinan bi  
min wisa tê ku ew ji ber ziman, kultur û rabûn û rûniştina  
miletê xwe serm dikin; ji ya xelkê hez dikin. Ger ne  
wisa bûya, diviyabû wan berî her tistî, li her derê, bi înad  
zimanê xwe bi kar bianîna. Tu ji mirovên welê re çî dibê-  
j»

Mirov dibêje qey ew ji bin hikmê bandêra biyaniyan naxwazin  
derkevin û hêsîrî bi wan şêrîn e. Heke welê ye, divêt rayekî  
biyaniyan di wan geriya be. Rakî welê ko bi dizîka bi  
wan ve bûye. Herwekî şairê sorî gotiye:

Her kesî kurd naseraw bî hez be bonî kurd ne ka

Pirsiyarî daye ley ka ta le babî xoy biga

Belê ew bi zimanê xwe ê mader nizanin.

Dibe ku jî zimanê wan ê mader, yanî kurdî giran be,  
zehmet be, loma ew nikarin wisa zû hîn bibin. Tu di vê

21

derheqê de dikarî çî bibêjî?

Xwendin û nivîsandina kurdî ji her zimanî hêsantir e. Min  
bi xwe ceribandîye, kurdekî nezan, li gora şehrazariya xwe di  
wextekî gelekî kurt de hînî elfabiya xwe dibe.

Wextekî çiqasî kurt?

Ji pênc heta sih rojî.

Yanî ew dikarin di hundurê demeke weha kurt de hîn zimanê xwe bibin lê dîsan jî naxwazin. Ev tistekî pir ecêb e, Xwedê vê sosretê bi serê tu milletên din de neyne. Wê çaxê ev bobelatek e ku bi serê kurdan de hatiye. Tu ya rastî bixwazî, mirov carinan ji van celeb kurdan pir hêrs û aciz dibe. Ez dizanim ku carinan cenabê te jî pir aciz bûye, heta te carekê ev çend rêzên han nivîsandibûn: "Malxirabino! ma we ewçend wext nîne, hon ko ji bo hînbûna zimanê biyaniyan bi salan ve xebitîne û îro jî dixebitin, ji bona bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin.

Kuro eyb e, şerm e, fehîr e, an hîn zimanê xwe bibin, an mebêjin em kurd in. Bê ziman kurdî jî we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîke giran e."

Digel vê jî ez bawer dikim hinek hene ku bi her awayî hewl didin ku hîn zimanê xwe bibin, ew dixwazin bi her awayî ji bin bandora biyaniyan derkevin. Dibe ku hejmara mirovên wisa kêmbin, lê dîsan jî heye. Tu ji mirovên weha re çi dibêjî?

22

derheqê de dikarî çi bibêjî?

Xwendin û nivîsandina kurdî ji her zimanî hêsantir e. Min bi xwe ceribandîye, kurdekî nezan, li gora şehrazariya xwe di wextekî gelekî kurt de hîn elfabiya xwe dibe.

Wextekî çiqasî kurt?

Ji pênc heta sih rojî.

Yanî ew dikarin di hundurê demeke weha kurt de hîn

zimanê xwe bibin lê dîsan jî naxwazin. Ev tistekî pir ecêb e, Xwedê vê sosretê bi serê tu milletên din de neyne. Wê çaxê ev bobelatek e ku bi serê kurdan de hatiye. Tu ya rastî bixwazî, mirov carinan ji van celeb kurdan pir hêrs û aciz dibe. Ez dizanim ku carinan cenabê te jî pir aciz bûye, heta te carekê ev çend rêzên han nivîsandibûn: "Malxirabino! ma we ewçend wext nîne, hon ko ji bo hînbûna zimanê biyaniyan bi salan ve xebitîne û îro jî dixebitin, ji bona bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin. Kuro eyb e, şerm e, fehîr e, an hînê zimanê xwe bibin, an mebêjin em kurd in. Bê ziman kurdîtî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîke giran e."

Digel vê jî ez bawer dikim hinek hene ku bi her awayî hewl didin ku hînê zimanê xwe bibin, ew dixwazin bi her awayî ji bin bandora biyaniyan derkevin. Dibe ku hejmara mirovên wisa kêm bin, lê dîsan jî heye. Tu ji mirovên weha re çi dibêjî?

22

Pesn û şabaş û hezar pîroz ji wan re ko hînê xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûne û bi vî awayî mifta heyîna xwe xistine bêrîka xwe û ji bin bandêra biyanî bi der ketine.

Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan re ko bi zimanên din dizanin bixwînin, binvîsînin û elfabiya zimanê xwe hêj nas nakin.

Hin kes hene mamoste, dibêjin, êdî ji me çûye, em bi emir in, ji bo me êdî dereng e ku em bikaribin hînê zimanê xwe bibin. Ma rast e, ji bo hînbûnê derengî heye?

Ji bo hînbûnê tucaran wext ne dereng e, û wextê hînbûnê li



tu kesî nabore.

Gelo tu ê bikaribî ji kerema xwe re behsa tarîxa Hawarê a sisiyan bikî?

Tarîxa sisiyan panzdehê Nîsana sala hezar û neh sed û çel û yekê ye.

Hawarên pêşîn, her bîst û şeş Hawar xebitiye kurdmancan hînê elfabiya wan bikin. Herwekî me li jor got, Hawar di nav miletê xwe ê bêdibistan de, kêr û zêde karê xwe bire serî. Hawar dîsan dê bixebite û tiştêkî din jî bi ser ve zêde bike. Wê çiyê din bi ser ve zêde bike mamoste?

Gramêr. Di Hawara pêşîn de min elfabêya xwe belav kiri bû. Di vê hejmarê de ezê dest bi belavkirina gramêra xwe bi-  
23

Pesn û şabaş û hezar pîroz ji wan re ko hînê xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûne û bi vî awayî mifta heyîna xwe xistine bêrîka xwe û ji bin bandêra biyanî bi der ketine.

Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan re ko bi zimanên din dizanin bixwînin, binvîsînin û elfabiya zimanê xwe hêj nas nakin.

Hin kes hene mamoste, dibêjin, êdî ji me çûye, em bi emir in, ji bo me êdî dereng e ku em bikaribin hînê zimanê xwe bibin. Ma rast e, ji bo hînbûnê derengê heye?

Ji bo hînbûnê tucaran wext ne dereng e, û wextê hînbûnê li tu kesî nabore.

Gelo tu ê bikaribî ji kerema xwe re behsa tarîxa Hawarê a sisiyan bikî?

Tarîxa sisiyan panzdehê Nîsana sala hezar û neh sed û çel û yekê ye.

Hawarên pêşîn, her bîst û şeş Hawar xebitiye kurdmancan hînê elfabiya wan bikin. Herwekî me li jor got, Hawar di nav miletê xwe ê bêdibistan de, kê m û zêde karê xwe bire serî. Hawar dîsan dê bixebite û tişteki din jî bi ser ve zêde bike. Wê çiyê din bi ser ve zêde bike mamoste?

Gramêr. Di Hawara pêşîn de min elfabêya xwe belav kiri bû. Di vê hejmarê de ezê dest bi belavkirina gramêra xwe bi-  
23

kim. Ev di zimanê kurdmancî a nivîskî de gaveke nû ye. Ji xwe hîmê zimanekî li ser sê hêmanên bingehîn sekiniye: elfabê, gramêr û ferheng. Me elfabê belav kir, îro jî dest bi belavkirina gramêrê dikin, ko Xwedê hez kir ferheng jî li pey e.

Em dizanin ku ziman berî giramerê tê. Yanî gava xelkê pêşî dest bi axaftinê kirine ew ne ku li giramerê fikirî ne.

Pêşî ziman ava bûye û pasê jî ji wî zimanê re hin qeyde hatine danîn. Lê pasê ew qeyde wilo bûne, ku mirov li gora wan qeydeyan neçe, şasiyên zimên beloq xuya dikin.

Yanî qeydeyên zimên û giramer bûne zimanê zimên.

Lê ez dixwazim dîsan jî ji cenabê te bipirsim, giramer çiyê?

Gramêrzanan gramêr bi awayên têvel tarîf kirine. Bi kurtî gramêr tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zimên e. Ev qeyde bi xwe ji zimên tene der. Belê herkes bi zimanê xwe ê mader bê ko bide eqlê xwe rast daxêve. Ev rastî bi hin qeydan tête pê û mirov dema xeberdanê de bê ko bizane bi wan ve diçe.

Gramêrzan li van qeydan hûr dibin, van ji hev derdixînin û disenifînin. Tevayiya van qeydan gramêr bi xwe ye.

Gelek spas mamoste. Lê ev agahdariyên ku te dan qeydeyên gistî ne û ji bo hemû zimanan derbas dibe. Ez dixwazim fikra cenabê te ya di derheqa gramera kurdî de hîn bibim. Bi vê ve girêdayî jî ez meraq dildm gelo te kengî dest bi xebata gramê kirîye?

24

kim. Ev di zimanê kurdmancî a nivîskî de gaveke nû ye. Ji xwe hîmê zimanekî li ser sê hêmanên bingehîn sekiniye: elfabê, gramê û ferheng. Me elfabê belav kir, îro jî dest bi belavkirina gramêê dikin, ko Xwedê hez kir ferheng jî li pey e.

Em dizanin ku ziman berî giramerê tê. Yanî gava xelkê pêşî dest bi axaftinê kirine ew ne ku li giramerê fikirî ne.

Pêşî ziman ava bûye û pasê jî ji wî zimanî re hin qeyde hatine danîn. Lê pasê ew qeyde wilo bûne, ku mirov li gora wan qeydeyan neçe, şasiyên zimên beloq xuya dikin.

Yanî qeydeyên zimên û giramer bûne zimanê zimên.

Lê ez dixwazim dîsan jî ji cenabê te bipirsim, giramer çi ye?

Gramêzanan gramê bi awayên têvel tarîf kirine. Bi kurtî gramê tevayiya qeydeyên rastaxftin û rastnivîsandina zimên e. Ev qeyde bi xwe ji zimên tene der. Belê herkes bi zimanê xwe ê mader bê ko bide eqlê xwe rast daxêve. Ev rastî bi hin qeydan tête pê û mirov dema xeberdanê de bê ko bizane bi wan ve diçe.

Gramêzanan li van qeydan hûr dibin, van ji hev derdixînin û disenifînin. Tevayiya van qeydan gramê bi xwe ye.

Gelek spas mamoste. Lê ev agahdariyên ku te dan qeydeyên gistî ne û ji bo hemû zimanan derbas dibe. Ez dixwazim

fikra cenabê te ya di derheqa gramera kurdî de hîn bibim. Bi vê ve girêdayî jî ez meraq dildm gelo te kengî dest bi xebata gramerê kirîye?

24

Gramêra ko ez îro di Hawarê de belav dikim, min bingehên wê di sala 1929an de li Hesîçê danî bû. Ji hingê ve ez lê dixebitim. Pêrar min gramêreke dibistanî digel hînek û wezîfan çêkiri bû. Bi destpêkirina şer min nikari bû ez wê bigihînim çapê.

Lê ji milê din hewcedariya me bi gramêrê roj bi roj bêtir dibû. Xortên ko hînî xwendin û nivîsandinê dibûn, dihatin û li qeydeyên zimanê xwe dipirsîn, gramêrek dixwestin. Di vê navê de me destûra derêxistina Hawarê ji nû ve stand. Hingê min dest bi senifandina gramêreke din kir. Ne gramêreke dibistanî, lê bingehên qeydeyên gramêra kurdmancî. . . Ji milê din min kitêbeke biçûk bi navê "Kitêba Sînemxanê" nivîsandi bû. Ev kitêba biçûk ji bo zarokan gramêreke biçûk e.

Mala te ava mamoste. Bi rastî bi xêra vê gramerê û bi xêra alfabeya ku cenabê te bingehê wê daniye, em îro dikarin bi hêsanî bixwînin û binivîsînin. Le ji ber ku hê jî dibistanên kurdî venebûne, kurd di dibistanan de bi kurdî naxwînin, loma zimanê kurdî bi qasî ku tê xwestin û bi qasî ku pêwîst e di nava xelkê de belav nabe û loma jî hejmara kesên ku hînî qeydeyên zimên dibin kêm û bi sînor dimînin. Di vî warî de tu şîret an jî pêsniyazeke te heye?

Belê bi tenê hînbûn ne besî me ye. Divê em hîn bikin jî.

Her kurdê ko xwendin û nivîsandinê dizane divêt yê ko nizanin bielimîne. Ji kurdê xwende re divêt, heke ber destên

\*5

Gramêra ko ez îro di Hawarê de belav dikim, min bingehên wê di sala 1929an de li Hesîçê danî bû. Ji hingê ve ez lê dixebitim. Pêrar min gramêreke dibistanî digel hînek û wezîfan çêkiri bû. Bi destpêkirina şer min nikari bû ez wê bigihînim çapê.

Lê ji milê din hewcedariya me bi gramêrê roj bi roj bêtir dibû. Xortên ko hînî xwendin û nivîsandinê dibûn, dihatin û li qeydeyên zimanê xwe dipirsîn, gramêrek dixwestin. Di vê navê de me destûra derêxistina Hawarê ji nû ve stand. Hingê min dest bi senifandina gramêreke din kir. Ne gramêreke dibistanî, lê bingehên qeydeyên gramêra kurdmancî.

. . Ji milê din min kitêbeke biçûk bi navê "Kitêba Sînemxanê" nivîsandi bû. Ev kitêba biçûk ji bo zarokan gramêreke biçûk e.

Mala te ava mamoste. Bi rastî bi xêra vê gramêrê û bi xêra alfabe ku cenabê te bingehê wê daniye, em îro dikarin bi hêsanî bixwînin û binivîsîn. Le ji ber ku hê jî dibistanên kurdî vebûne, kurd di dibistanan de bi kurdî naxwînin, loma zimanê kurdî bi qasî ku tê xwestin û bi qasî ku pêwîst e di nava xelkê de belav nabe û loma jî hejmara kesên ku hînî qeydeyên zimên dibin kêm û bi sînor dimînin. Di vî warî de tu şîret an jî pêsnîyazeke te heye?

Belê bi tenê hînbûn ne besî me ye. Divê em hîn bikin jî.

Her kurdê ko xwendin û nivîsandinê dizane divêt yê ko nizanin

bielimîne. Ji kurdê xwende re divêt, heke ber destên

\*5

wî de kurdên nezan nînin, li wan bigere, wan peyda û hîn bike.

Bi hinan hînkirin bi qasî hînbûnê xweş e, heye ko xweştir û bi rûmetir e jî. Belê heke hînbûn berhevkin û standin e, hînkirin dander û dayîn e. Ji xwe kurdmanc bi nav û deng in ko destê danê ne.

Di vî warî de gotineke te ji xwendevanên me re heye?

Belê hîn bin û vê carê ji berê bêtir û çêtir û bi awakî tekûz.

Berê di destên we de bi tenê elfabê hebû, niho gramêr jî gihaye we.

FIRAT CEWERÎ: Digel ku te evqas tehb dîtiye, te bingehê alfabe

û gramera kurdmancî daniye û te bi hemû jiyana

xwe xwe fedayî vî karî kiriye jî, dîsan kurd zêde Hawarê

naxwînin. Ev yeka han jî ji nameya xwendevanê tediyar

dibe. Xwendevanekî te î bi navê Hebeş Smaîn di sala

194îê de ji te re ev çend rêzên ha nivîsandibûn: "Ezbenî!

îro ji postê pênc heb Hawar li ser navê min hatine. Ez

hêvî dikim ji niho û pê de ji min bi tenê re hejmarekê bisîne. Ji

ber ko kes Hawarê naxwîne".

Te ev nameya ha di nava rûpelên Hawarê de jî wesand.

26

wî de kurdên nezan nînin, li wan bigere, wan peyda û hîn bike.

Bi hinan hînkirin bi qasî hînbûnê xweş e, heye ko xweştir û bi rûmetir e jî. Belê heke hînbûn berhevkin û standin e, hînkirin dander û dayîn e. Ji xwe kurdmanc bi nav û deng

in ko destê danê ne.

Di vî warî de gotineke te ji xwendevanên me re heye?

Belê hîn bin û vê carê ji berê bêtir û çêtir û bi awakî tekûz.

Berê di destên we de bi tenê elfabê hebû, niho gramêr jî gihaye we.

FIRAT CEWERÎ: Digel ku te evqas tehb dîtîye, te bingehê alfabe

û gramera kurdmancî daniye û te bi hemû jiyana

xwe xwe fedayî vî karî kiriye jî, dîsan kurd zêde Hawarê

naxwînin. Ev yeka han jî ji nameya xwendevanê tediyar

dibe. Xwendevanekî te î bi navê Hebeş Smaîn di sala

194îê de ji te re ev çend rêzên ha nivîsandibûn: "Ezbenî!

îro ji postê pênc heb Hawar li ser navê min hatine. Ez

hêvî dikim ji niho û pê de ji min bi tenê re hejmarekê bisîne. Ji

ber ko kes Hawarê naxwîne".

Te ev nameya ha di nava rûpelên Hawarê de jî wesand.

26

Çima? Armanca te bi vê yekê çi bû?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Vîtika Mîrza Hebeş Smaîn peyameke

tehil û şêrîn e. Şêrîn e, ji ber ko ew rastiye dibêje. Lê

belê ew rastî bi xwe tehil e. Belê Mîrza Smaîn ji xwediyê Hawarê

hêvî dike ko jê re ji yekê bêtir Hawaran neşîne.

Çima mamoste? Ma qey bi rastî kesî Hawar nedixwend?

Çimkî di welatê wî de kes Hawarê naxwîne û pê bendewar

nabe.

Ez bawer dikim Mîrza Hebeş nameya xwe ji Mekteleyê ji

te re şandibû. Ma qey kurd U Mekteleyê tunebûn? An

hebûn lê mîna kurdên îro guh nedidan xwendina zarê

xwe? Ji xwe wê demê çi bigire bi tenê Hawar bi zarê wan

derdiket. Em bibêjin gundî û nexwendan bi girîngiya wê nizanîbûn, lê ma gelo dewlemend, sêx û axayên kurdan nikarîbûn Hawarek xwedî bikirana?

Mektele û kaniya Ereban di Sûriyê de merkezine kurdmancan in. Ew erd birekî deşta Sirûcê ye; meqamê begler û axaler û eşîran e. Ma rewayî heq e ko Mîrza Smaîl, di welatekî kurdmancan de ji çar hejmarên Hawarê re xwendevanan peyda nekit. Heke di dora kaniyê de hêj ew kurdên xwenda nînin jê bi tenê mezinên kurdan berpirsiyar in. Emê li hêviya pêjna dengê xwe bimînin.

27

Çima? Armanca te bi vê yekê çi bû?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Vîtika Mîrza Hebeş Smaîn peyameke tehil û şêrîn e. Şêrîn e, ji ber ko ew rastiyê dibêje. Lê belê ew rastî bi xwe tehil e. Belê Mîrza Smaîn ji xwediya Hawarê hêvî dike ko jê re ji yekê bêtir Hawaran neşîne.

Çima mamoste? Ma qey bi rastî kesî Hawar nedixwend?

Çimkî di welatê wî de kes Hawarê naxwîne û pê bendewar nabe.

Ez bawer dikim Mîrza Hebeş nameya xwe ji Mekteleyê ji te re şandibû. Ma qey kurd U Meketeleyê tunebûn? An hebûn lê mîna kurdên îro guh nedidan xwendina zarê xwe? Ji xwe wê demê çi bigire bi tenê Hawar bi zarê wan derdiket. Em bibêjin gundî û nexwendan bi girîngiya wê nizanîbûn, lê ma gelo dewlemend, sêx û axayên kurdan nikarîbûn Hawarek xwedî bikirana?

Mektele û kaniya Ereban di Sûriyê de merkezine kurdmancan in. Ew erd birekî deşta Sirûcê ye; meqamê begler û axaler



û eşîran e. Ma rewayî heq e ko Mîrza Smaîl, di welatekî kurdmancan de ji çar hejmarên Hawarê re xwendevanan peyda nekit. Heke di dora kaniyê de hêj ew kurdên xwenda nînin jê bi tenê mezinên kurdan berpîrsiyar in. Emê li hêviya pêjna dengê xwe bimînin.

27

FIRAT CEWERÎ: Digel nebûna xwendevanan jî te dîsan Hawara xwe derdixist. Ez bawer dikim ev ji ber dûrbînî û baweriya te ya xurt tê. Te bi vê xebata xwe rola zilamê ku zimanek xelas kiriye, leyist. Min çîroka vî zilamê ku zimanek xelas kiribû jî ji te bihîstibû. Tê gotin ku zilamek dikare zimanekî xelas bike, ji mirinê vejîne. Gelo ev mumkun e mamoste? Çawan zilamek bi serê xwe dikare zimanekî mirî xelas bike û zindî bike?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne.

Gelo mînakên wilo li dinyayê hene? Dî dîrokê de yekî welê heye ku zimanek xelas kiriye?

Herwekî em ê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanên zindî, nav wan zimanên ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eşkere dikan.

Ev gotina "zimanê mirî" û "zimanê zindî" bala min dikisîne.

Ma çawan ziman dikarin bimirin an jî zindî bimî-

28

FIRAT CEWERÎ: Digel nebûna xwendevanan jî te dîsan Hawara xwe derdixist. Ez bawer dikim ev ji ber dûrbînî û baweriya te ya xurt tê. Te bi vê xebata xwe rola zilamê ku

zimanek xelas kiriye, leyist. Min çîroka vî zilamê ku zimanek xelas kiribû jî ji te bihîstibû. Tê gotin ku zilamek dikare zimanekî xelas bike, ji mirinê vejîne. Gelo ev mumkun e mamoste? Çawan zilamek bi serê xwe dikare zimanekî mirî xelas bike û zindî bike?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne.

Gelo mînakên wilo li dinyayê hene? Dî dîrokê de yekî welê heye ku zimanek xelas kiriye?

Herwekî em ê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanên zindî, nav wan zimanên ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eşkere dikin.

Ev gotina "zimanê mirî" û "zimanê zindî" bala min dikisîne.

Ma çawan ziman dikarin bimirin an jî zindî bimî-

28

nin? Xuyaye cenabê te zimanan jî dişibîne rihberan. Tu dikarî ji kerema xwe re bi çend gotinan vê mijarê hebekî vekî?

Ji awirê jiyînbariyê ziman wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordûnda diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kêl ne kitêb. Hinên din di pey xwe re eserine mezin, kitêbine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî îro jî têne xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ko êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Ev kîjan ziman in mamoste?

Li Ewropayê latînî, li rohelatê nîzing ibranî zimanê mirî ye.

Te got, ibranî zimanekî mirî ye. . . Lê belê îro gelek kes bi ibranî dipeyivin. An gelo ez saş im?. . . Lê herçî ibranî êdî ne zimanekî mirî lê belê zimanekî zindî

ye.

Ji gotina te xuya dibe ku ibranî berê zimanekî mirî bû lê niha zindî bûye. Ma kê ew zindî kir, çawan zindî bûye? Belê ew mirovê bivên di nav cihyan de derket û zimanê ibranî vejand. Ibranî zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û

29  
nin? Xuyaye cenabê te zimanan jî dişibîne rihberan. Tu dikarî ji kerema xwe re bi çend gotinan vê mijarê hebekî vekî?

Ji awirê jiyînbariyê ziman wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordûnda diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kêl ne kitêb. Hinên din di pey xwe re eserine mezin, kitêbine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî îro jî têne xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ko êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Ev kîjan ziman in mamoste?

Li Ewropayê latînî, li rohelatê nîzing ibranî zimanê mirî ye.

Te got, ibranî zimanekî mirî ye. . . Lê belê îro gelek kes bi ibranî dipeyivin. An gelo ez saş im?. . . Lê herçî ibranî êdî ne zimanekî mirî lê belê zimanekî zindî

ye.

Ji gotina te xuya dibe ku ibranî berê zimanekî mirî bû lê niha zindî bûye. Ma kê ew zindî kir, çawan zindî bûye?

Belê ew mirovê bivên di nav cihyan de derket û zimanê ibrani  
vejand. Ibrani zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê  
erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û  
29

nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanîn û di kaniştan de tewrat  
bi vî zimanî dihate xwendin.

Baş e, ma berê cihû bi kîjan zimanî dipeyvîn? Gelo zimanekî  
wan yê milî tunebû?

Herçî cihî bi zimanine din, bi zimanên welatên ko tê de rû-  
diniştin xeber didan. Yanî cihyan zimanekî milî, zimanekî  
xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan.  
Ez dixwazim dîsan vegeirîia serroia kesekî ya xelaskirina  
zimanekî. Cenabê te got ku zîatmdk dikare zimanekî xelas  
bike. Tu bikaribî ji kerema xwe re mîsaleke konkret  
bidî wê bas bibe...

Di welatê ûris de xortekî cihî bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû.  
. . Yehûda didît ko halê miletê wî ji halê her miletê din  
xirabtir e. Cihî ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê  
wan jî nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihî qerara xwe da û di dilê xwe de got: divêt cihî vegeirin  
welatê pêşiyên xwe, welatê kurên îsraîl, û dîsan divêt  
ko cihyan jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin.  
Ew ziman jî zimanê pêsiyan, zimanê ibrani ye.

Û Yehûda hînî zimanê xwe bû. . . Yehûda hînî zimanê xwe bû û di  
sala i8/8an de qesta Parîsê,  
qesta wî bajarê mêvanhewîn kir.

30

nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanîn û di kaniştan de tewrat

bi vî zimanî dihate xwendin.

Baş e, ma berê cihû bi kîjan zimanî dipeyvîn? Gelo zimanekî wan yê milî tunebû?

Herçî cihî bi zimanine din, bi zimanên welatên ko tê de rûdiniştin xeber didan. Yanî cihyan zimanekî milî, zimanekî xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan. Ez dixwazim dîsan vegeirîia serroia kesekî ya xelaskirina zimanekî. Cenabê te got ku zîatmdk dikare zimanekî xelas bike. Tu bikaribî ji kerema xwe re mîsaleke konkret bidî wê bas bibe...

Di welatê ûris de xortekî cihî bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû. . . Yehûda didît ko halê miletê wî ji halê her miletê din xirabtir e. Cihî ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê wan jî nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihî qerara xwe da û di dilê xwe de got: divêt cihî vegeirin welatê pêşiyên xwe, welatê kurên îsraîl, û dîsan divêt ko cihyan jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin.

Ew ziman jî zimanê pêsiyan, zimanê ibranî ye.

Û Yehûda hînî zimanê xwe bû. . . Yehûda hînî zimanê xwe bû û di sala i8/8an de qesta Parîsê, qesta wî bajarê mêvanhewîn kir.

30

Çima ew neçû Felestînê lê çû Parîsê?

Li Parîsê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihiyên Parîsê bû. Elyêzer ji alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fikrên xwe ên milî belav dikirin.

Ma qet kesekî weke Elyêzer biazil li dinyayê an jî li Parîsê tunebû? Gelo welatîyên wî bi a wî dikirin, didan dûv

fikrênwî?

Welatîyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ev mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezin re bi vênêke xurt û mezin û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kiribû serê xwe ji miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê. Di sala i88iê de Elyêzer keça mamosteyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Felestînê. Bi vî awayî jinîkek, hîmê xanimanekê, keti bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rê ve, di vaporê de dursa jina xwe got û hetanî ko gehîştin erdê Felestînê jina wî hînî çend pirsên ibranî bûbû.

Gava pê li erdê pêşîyan kirin Yehûda gote jina xwe, ji niho û pê de emê bi tenê bi ibranî xeber bidin.

Te got ku jinîk di vaporê de hînî çend gotinên ibranî bûbû û mêrê wê jî, yanî Mîrza Elyêzer biryarê dide ku li malê bi tenê bi ibranî bipeyivin. Bas e, wê çawan ji hev tê bigihîstina?

Ibraniya jinîkê gelek hindik bû. Jinîkê kir ne kir lê mêrê wê 3i

Çima ew neçû Felestînê lê çû Parîsê?

Li Parîsê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihiyên Parîsê bû. Elyêzer ji alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fikrên xwe ên milî belav dikirin.

Ma qet kesekî weke Elyêzer bîaqil li dinyayê an jî li Parîsê tunebû? Gelo welatîyên wî bi a wî dikirin, didan dût fikrênwî?

Welatîyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ev mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezin re bi vênêke xurt û mezin û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kiribû

serê xwe ji miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê.  
Di sala 1881ê de Elyêzer keça mamosteyê xwe ji xwe re anî  
û berê xwe da Felestînê. Bi vî awayî jinikek, hîmê xanimanekê,  
keti bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rê ve,  
di vaporê de dersa jina xwe got û hetanî ko gehîştin erdê Felestînê  
jina wî hînî çend pirsên ibranî bûbû.

Gava pê li erdê pêşyan kirin Yehûda gote jina xwe, ji niho  
û pê de emê bi tenê bi ibranî xeber bidin.

Te got ku jinik di vaporê de hînî çend gotinên ibranî bû-  
bû û mêrê wê jî, yanî Mîrza Elyêzer biryarê dide ku li  
malê bi tenê bi ibranî bipeyivin. Bas e, wê çawan ji hev  
tê bigihîstina?

Ibraniya jinikê gelek hindik bû. Jinikê kir ne kir lê mêrê wê  
3i

ji qerara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye ko zaroyên Yehûda  
hetanî ko bûne xort ji ibranîyê pê ve bi tu zimanî ne  
dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesibandin.

Ma ne guneh bû ku ew zarok bi tenê bi ibranîyê dipeyivîn?  
Çi heqî wî li zarokên wî hebû?

Lê bi vî laliyê miletê cihî wek miletine din bû xwediyê zimanekî,  
xwediyê zimanekî xweser.

Gelo rewşa Yehûda a aborî çawan bû? Ger ew bi tenê bi  
ibranî dipeyivîn ez bawer dikim wê ji bo wan dîtina kar  
jî zehmet ba, ma ne welê ye mamoste?

Yehûda û xelkê mala wî di zîvariyê de dijîn. Lê çi xem. Ji fikirine  
mezin re fedekarîne mezin divêtin. Ji ber ko xelk bi  
derbekê bîra fikra mezin habe. Yehûda nanê tisî dixwar, lê  
gava didît ko xelkê mala wî bi ibranî xeber dida, bawer bikin

xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Xuyaye rewsa Yehûda dişibiya rewsa me ya îro. Em jî îro di hundurê zîvariyê de dijîn, lê em dixwazin zimanê xwe zindî bihêlin. Em bi nanê zarokên xwe kovar û pirtûkan çap dikin. Ez naxwazim gazinan bikim, lê ez dikarim bibêjim ku kovara Nûdemê ji aliyê moral ve ez bilind kirime, lê di warê aborî de jî ez li paş histîme. Ji xwe herçî rewsa cenabê te ye, xanima te Rewsen Xanimê ji min re behs kiribû, ez pir li ber ketibûm, lê tu li ber çavên min 3i

ji qerara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye ko zaroyên Yehûda hetanî ko bûne xort ji ibranîyê pê ve bi tu zimanî ne dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesibandin.

Ma ne guneh bû ku ew zarok bi tenê bi ibranîyê dipeyvîn?

Çi heqî wî li zarokên wî hebû?

Lê bi vê laliyê miletê cihî wek miletine din bû xwediyê zimanekî, xwediyê zimanekî xweser.

Gelo rewşa Yehûda a aborî çawan bû? Ger ew bi tenê bi ibranî dipeyvîn ez bawer dikim wê ji bo wan dîtina kar jî zehmet ba, ma ne welê ye mamoste?

Yehûda û xelkê mala wî di zîvariyê de dijîn. Lê çî xem. Ji fikirine mezin re fedekarîne mezin divêtin. Ji ber ko xelk bi derbekê bîra fikra mezin habe. Yehûda nanê tisî dixwar, lê gava didît ko xelkê mala wî bi ibranî xeber dida, bawer bikin xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Xuyaye rewsa Yehûda dişibiya rewsa me ya îro. Em jî îro di hundurê zîvariyê de dijîn, lê em dixwazin zimanê xwe zindî bihêlin. Em bi nanê zarokên xwe kovar û pirtûkan



çap dikin. Ez naxwazim gazinan bikim, lê ez dikarim bibêjim  
ku kovara Nûdemê ji aliyê moral ve ez bilind kirime,  
lê di warê aborî de jî ez li paş histîme. Ji xwe herçî  
rewsa cenabê te ye, xanima te Rewsen Xanimê ji min re  
behs kiribû, ez pir li ber ketibûm, lê tu li ber çavên min  
3i

mezintir bûbûyî. Û bi xêra te ye kui ez û bi dehan kesên  
mîna min îro dane ser vê riyê. . . Ez dixwazim dîsan vegerim ser  
mîrza Yehûda. Ew bi

rastî jî mirovekî pir entresan xuyaye. 11 dinyayê mirovên  
weha pir kê in. Ez ne sas bim te behsa wî û derxistina  
rojnameyekê jî kiribû. Ew çawan bû mamoste? Ger  
xwendevan tunebin, gelo maneya deirxistina kovar û rojnameyan  
heye?

Dawiyê Yehûda rojnameyêke bi ibranî l)elav kir û ji xwe re  
xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hiri dibistanên cihî  
de dest bi xwendina ibranîyê jî kirin. , Ji milê din Yehûda ferhenga  
milctê xwe çêdikir û bêjeyên

ko di zimanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê ibranî  
jî di nav cihyan de beîav dibû. Di sala 1922an de gava  
Elyêzer bin Yehûda mir zimanê ibranî yê ko berî 30-40 salî  
zimanekî mirî bû, bû bû zimanê miletekî. Ev ziman îro di  
Felestînê û di rex erebî û îngilîziyê de zimanekî resmî, zimanê  
dewlet û hikûmetê ye jî.

Bi rastî jî gava mirov li serpêhatiya vî camêrê cihû guhdarî  
dike, mirov ji kurdan aciz dibe. Camêr zimanekî  
mirî zindî kiriye, lê kurd zimanê xwe yê zindî dikujin, an  
jî ji kuştina zimanê xwe re temasevan dimînin, lê xwedî

dernamekin, wî neparêzin. Ma ne welê ye mamoste? Di vê derheqê de bangeke te ji kurdan re heye?

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ko bi vêna zilamekî

33

mezintir bûbûyî. Ê bi xêra te ye kui ez ê bi dehan kesên mîna min îro dane ser vê riyê. . . Ez dixwazim dîsan vegerim ser mîrza Yehûda. Ew bi

rastî jî mirovekî pir entresan xuyaye. 11 dinyayê mirovên weha pir kêr in. Ez ne sas bim te behsa wî û derxistina rojnameyekê jî kiribû. Ew çawan bû mamoste? Ger xwendevan tunebin, gelo maneya deirxistina kovar û rojnameyan heye?

Dawiyê Yehûda rojnameyêke bi ibranî l)elav kir û ji xwe re xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hiri dibistanên cihê de dest bi xwendina ibranîyê jî kirin. , Ji milê din Yehûda ferhenga milctê xwe çêdikir û bêjeyên

ko di zimanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê ibranî jî di nav cihyan de beîav dibû. Di sala 1922an de gava Elyêzer bin Yehûda mir zimanê ibranî yê ko berî 30-40 salî zimanekî mirî bû, bû bû zimanê miletekî. Ev ziman îro di Felestîne û di rex erebî û îngilîziyê de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Bi rastî jî gava mirov li serpêhatiya vî camêrê cihû guhdarî dike, mirov ji kurdan aciz dibe. Camêr zimanekî mirî zindî kiriye, lê kurd zimanê xwe yê zindî dikujin, an jî ji kuştina zimanê xwe re temasevan dimînin, lê xwedî dernamekin, wî neparêzin. Ma ne welê ye mamoste? Di vê derheqê de bangeke te ji kurdan re heye?

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ko bi vêna zilamekî  
33

tête pê. Di kar û biserhatiya vî zilamî de pend û derseke mezin  
heye. Herçî milletên bîndest û bêziman an bê zimanê nivîskî  
divêt jê ibretê bigirin. Herçî em kurd, me ziman, me zimanekî  
delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanî  
pê ve bi tti zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin  
û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Ew camêr yek bû ku li zimanê xwe xwedî derket û ew ji  
mirinê şiyar kir û î;indî kir. Lê ez bawer dikim ew nayê  
wê maneyê ku xelaskirina zimanekî an jî ya miletekî bi  
tenê bi zilamekî ve girêdayî ye. Cenabê te çi dibêje gelo?  
I' îro hînbûn û xwendina zimanê mader ji bo her milletî êdî ne  
bi tenê wezîfêke şexsî lê wezîfêke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê  
ranebûne, wezîf'a xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî milletê.  
xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bihesibîne  
divêt bi kêrî wî bêt.

Bi rastî gava ku mirov kûr lê difikire, mirov rewşa te di-  
şibîne rewşa Elyêzer bin Yehûda. Erê zimanê kurdî mîna  
zimanê ibranî nemiribû, lê çi bigire di warê nivîsandinê  
de zimanekî mirî bû. Lê cenabê te bi hêzeke xurt, xwe da  
vê yekê û ji me re bingehê zimanê me yê nivîskî danî. Çiqasî  
cihû spasdarê Elyêzer bin Yehûda be, diyê kurd jî  
ewqasî û hê bêtir jî sikardar û spasdarê cenabê te bin.  
Pisrî ku bingehê zimên hate avêtin û te em kirin xwediyê  
alfabeyeke xweser, ez dibêjim wê xwendin û nivîsandina  
wî jî ne ewçend zehmet be. Ne welê ye mamoste?

34

tête pê. Di kar û biserhatiya vî zilamî de pend û derseke mezin heye. Herçî milletên bîndest û bêziman an bê zimanê nivîskî divêt jê ibretê bigirin. Herçî em kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tti zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Ew camêr yek bû ku li zimanê xwe xwedî derket û ew ji mirinê şiyar kir û î;indî kir. Lê ez bawer dikim ew nayê wê maneyê ku xelaskirina zimanekî an jî ya miletekî bi tenê bi zilamekî ve girêdayî ye. Cenabê te çi dibêje gelo? I' îro hînbûn û xwendina zimanê mader ji bo her milletî êdî ne bi tenê wezîfêke şexsî lê wezîfêke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne, wezîf'a xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî milletê. xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bihesibîne divêt bi kêrî wî bêt.

Bi rastî gava ku mirov kûr lê difikire, mirov rewşa te di-şibîne rewşa Elyêzer bin Yehûda. Erê zimanê kurdî mîna zimanê ibranî nemiribû, lê çi bigire di warê nivîsandinê de zimanekî mirî bû. Lê cenabê te bi hêzeke xurt, xwe da vê yekê û ji me re bingehê zimanê me yê nivîskî danî. Çiqasî cihû spasdarê Elyêzer bin Yehûda be, diyê kurd jî ewqasî û hê bêtir jî sikardar û spasdarê cenabê te bin. Pîsrî ku bingehê zimên hate avêtin û te em kirin xwediyê alfabeke xweser, ez dibêjim wê xwendin û nivîsandina wî jî ne ewçend zehmet be. Ne welê ye mamoste?

34

35

Pîştî ko em kurd jî wek milletên din bûne xwediyê elfabeke

xweser, xwendin û nivîsandina zimanê me gelek hêsanî bû-  
ye.

Çawan? Yanî kurd di hundurê demeke çiqas kin an dirêj  
de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin?  
Tecribê şanî daye ko li gora jîriya mirov kurd ji heftê heta  
çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê  
xwe bibin. Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanê xwe ê mader  
dizanin û ji lewre li mal be ji derve be bi tenê bi kurdî  
dipeyivin.

Lê ev jî rastiyeke e ku hinek kurd asîmîle bûne, zimanê  
xwe ji bîr kirine, lê kurdîtiya xwe înkâr nakin û heta ji  
bo kurdîtiyê tîn girtin, îskencê dibînin û bi salên dirêj di  
girtîgehan de radizên. Lê mixabin, ew bi kurdî nizanin.

Gelo pêsnîyazeke te ji bo van mirovên me heye?

Di nava kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahiyê  
an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê  
ko ji vê hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî  
ewilî hînî wî bibin û piştê di nav mala xwe û bi zar û zê-  
çên xwe re herwekî Elyêzer fikir bi tenê bi kurdî xeber bidin.  
Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve tîne mal, herwekî  
cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrînin, zi-

36

Piştî ko em kurd jî wek milletên din bûne xwediyê elfabeke  
xweser, xwendin û nivîsandina zimanê me gelek hêsanî bû-  
ye.

Çawan? Yanî kurd di hundurê demeke çiqas kin an dirêj  
de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin?  
Tecribê şanî daye ko li gora jîriya mirov kurd ji heftê heta

çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanê xwe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derve be bi tenê bi kurdî dipeyivin.

Lê ev jî rastiyeke e ku hinek kurd asîmîle bûne, zimanê xwe ji bîr kirine, lê kurdîtiya xwe înkâr nakin û heta ji bo kurdîtiyê tên girtin, îskencê dibînin û bi salên dirêj di girtîgehan de radizên. Lê mixabin, ew bi kurdî nizanin.

Gelo pêsnîyazeke te ji bo van mirovên me heye?

Di nava kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahiyê an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê ko ji vê hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî ewilî hînî wî bibin û piştî di nav mala xwe û bi zar û zêçên xwe re herwekî Elyêzer fikir bi tenê bi kurdî xeber bidin.

Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve têne mal, herwekî cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrînin, zi-  
36

manê xwe jî welê biguhêrînih û bi zimanê kuçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştêkî miqedes hilînin.

FIRATCEWERÎ: Hîn ku sohbeta me U ser zimên e, serpêhatîyeke te hate bîra min. Tu carekê ji bo kirîna kaxezên Hawarê çûbûyî Bêrûdê. Tu hingî li barkêsekî kurmanc rast hatibûyî. Yê barkêş bi dîtina te gelekî kêfxwes bûbû. Gava tu li dikana kaxezfiros dipeyivî, ew barkêşê ha her dikeniya. Ez bawer dikim ew ji ber kurmanciya te ewqasî kêfxwes bûbû. Ne ku wî zarê kurmancî nebihîstibû, li gora gotina wî, wî her roj ji hevalên xwe yê barkêş kurmancî

dibihîst. Ez bawer dikim ew kêfxwes dibû ku kurmancî  
ji devê mîrekî û rewşenbîrekî dibihîst. Xwedê giravî  
gava tu dipeyivî, wî bi devkenî li te guhdarî dikir.

Hingî te jê re gotibû çî?

CELADET ALÎBEDIR-XAN: Xorto, te xêr e, çire dikenî?

Wî gotibû çî?

Gotibû, xêr e ez xulam, ji kêfa kurdmanciyê, ji kêfa kurdmanciya  
te dikenim. Belê li Bêrûdê kurdmanc zehf in. Ji sibê

37

manê xwe jî welê biguhêrînih û bi zimanê kuçê di nav malê  
de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştê miqedes  
hilînin.

FIRATCEWERÎ: Hîn ku sohbeta me U ser zimên e, serpêhatiyêke  
te hate bîra min. Tu carekê ji bo kirîna kaxezên Hawarê  
çûbûyî Bêrûdê. Tu hingî li barkêsekî kurmanc rast  
hatibûyî. Yê barkêş bi dîtina te gelekî kêfxwes bûbû. Gava  
tu li dikana kaxezfiros dipeyivî, ew barkêşê ha her dikeniya.

Ez bawer dikim ew ji ber kurdmanciya te ewqasî  
kêfxwes bûbû. Ne ku wî zarê kurmancî nebihîstibû, li  
gora gotina wî, wî her roj ji hevalên xwe yên barkêş kurmancî  
dibihîst. Ez bawer dikim ew kêfxwes dibû ku kurmancî  
ji devê mîrekî û rewşenbîrekî dibihîst. Xwedê giravî  
gava tu dipeyivî, wî bi devkenî li te guhdarî dikir.

Hingî te jê re gotibû çî?

CELADET ALÎBEDIR-XAN: Xorto, te xêr e, çire dikenî?

Wî gotibû çî?

Gotibû, xêr e ez xulam, ji kêfa kurdmanciyê, ji kêfa kurdmanciya  
te dikenim. Belê li Bêrûdê kurdmanc zehf in. Ji sibê

37

heta bi êvarê em bi kurdmancî xeber didin. Lê gava ji devê te dibihîzim hêj bêtir kêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî kurdmancî çiqas şêrîn e.

Te çi lê vegerandibû mamoste?

Na herê, kurdmancî kengî bûye şêrîn.

Ev ji bo min balkês e. Ez dixwazim bizanibim ka gelo nêrîna barkêsekî li ser zimanê kurdî çi bû. Gelo wî gotibûçi? Gotibû, bi serê te yê ezîz, tu ziman wek kurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirkî rind nizanîm, lê min ew gelekî bihîstiyê. Li Iraqê min erebî û ingilîzî gelekî bihîstine. Li Sûriyê her rûj erebî û frensîzî dibihîzim. Ez van datînim ber hev û dibînim ko şêraniya zimanê kurdmancî di tuwan de nîne. Lê çi fêde ew bi kurdmancî nizanî.

"Ma bizaniyana çi dibû?"

Hingî, ji kurdmanciyê pêve bi tu zimanan xeber ne didan. . .

38

heta bi êvarê em bi kurdmancî xeber didin. Lê gava ji devê te dibihîzim hêj bêtir kêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî kurdmancî çiqas şêrîn e.

Te çi lê vegerandibû mamoste?

Na herê, kurdmancî kengî bûye şêrîn.

Ev ji bo min balkês e. Ez dixwazim bizanibim ka gelo nêrîna barkêsekî li ser zimanê kurdî çi bû. Gelo wî gotibûçi? Gotibû, bi serê te yê ezîz, tu ziman wek kurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirkî rind nizanîm, lê min ew gelekî bihîstiyê. Li Iraqê min erebî û ingilîzî gelekî bihîstine. Li Sûriyê her rûj erebî û frensîzî dibihîzim. Ez van datînim ber hev û dibînim ko



şêraniya zimanê kurdmancî di tuwan de nîne. Lê çî fêde ew bi kurdmancî nizanin.

"Ma bizaniyana çî dibû?"

Hingî, ji kurdmanciyê pêve bi tu zimanan xeber ne didan. . .

38

FIRAT CEWERÎ: Tiştêkî balkêş U ba te heye, mamoste! Digel ku tu mîr bûyî, te tu caran xwe li ser serê kurdan mezin nedikir. Digel tu evqasî geriyayî û te evqas dinya dîtiye, te tu caran kurd biçûk nedidîtin. Ne ku ez pesnê bêsebeb didim, na xêr, ez vê helwestê di hemû nivîsên te de dibînim. Te her tim guh daye kurdan, te ew biçûk nexistine, te erza wan nesikandiye. Bi rastî jî gava mirov nivîsên te dixwîne, mirov dibîne bê tu çiqasî teswîqkar bû. Bi ya min ev aliyê te zehf erînî ye. Ji zarokan bigire heta bi şivan û nexwendîyan te kurd teswîqî xwendin û nivîsandina zarê kurdî dikir. Hin mînakên ku têne bîra min ez dixwazim ji cenabê te bipirsim. Gava te dest bi derxistina Hawarê kiribû, ji kurê Mihemed beg Wecdî Cemîl li ser xwendina kurdî ji te re nameyek şandibû. Ez bawer dikim Wecdî hingî sêzdeh salî bû. Bi rastî jî nameya wî agir berdide dilê mirov. Ew ji gotinên sêzdehsaliyekî wêdetir, şîret û gotinên kalekî heystê salî î bi tecrube tîne bîra mirov. Ew vê dawiyê ii Ankarayê bi cih bûbû û hal û wextê wî jî xwes bû. Gava min bihîstibû ku ew li Ankarayê ye, min dil kir ku ez digel nameya wî biçim seredana wî û jê re bibêjim: "Mamo, va ye me jî dest bi nivîsandina zarê kurdî kiriye", lê hew min bihîst ku Wecdî beg wefat kiriye.

Ez dizanim ku te ji Wecdî re bersivek nivîsandibû. Ger tu bikaribî ji kerema xwe re ji me re bi kurtî behsa wê bersivê bikî wê pir bas bibe. Ji ber ku di wê bersivê de ji bo biçûk û mezinên kurdan sîretin gelekî baş hene.

39

FIRAT CEWERÎ: Tiştêkî balkêş U ba te heye, mamoste! Digel ku tu mîr bûyî, te tu caran xwe li ser serê kurdan mezin nedikir. Digel tu evqasî geriyayî û te evqas dinya dîtiye, te tu caran kurd biçûk nedidîtin. Ne ku ez pesnê bêsebeb didim, na xêr, ez vê helwestê di hemû nivîsên te de dibînim. Te her tim guh daye kurdan, te ew biçûk nexistine, te erza wan nesikandiye. Bi rastî jî gava mirov nivîsên te dixwîne, mirov dibîne bê tu çiqasî teswîqkar bû. Bi ya min ev aliyê te zehf erînî ye. Ji zarokan bigire heta bi şivan û nexwendîyan te kurd teswîqî xwendin û nivîsandina zarê kurdî dikir. Hin mînakên ku têne bîra min ez dixwazim ji cenabê te bipirsim. Gava te dest bi derxistina Hawarê kiribû, ji kurê Mihemed beg Wecdî Cemîl li ser xwendina kurdî ji te re nameyek şandibû. Ez bawer dikim Wecdî hingî sêzdeh salî bû. Bi rastî jî nameya wî agir berdide dilê mirov. Ew ji gotinên sêzdehsaliyekî wêdetir, şîret û gotinên kalekî heystê salî î bi tecrube tîne bîra mirov. Ew vê dawiyê ii Ankarayê bi cih bûbû û hal û wextê wî jî xwes bû. Gava min bihîstibû ku ew li Ankarayê ye, min dil kir ku ez digel nameya wî biçim seredana wî û jê re bibêjim: "Mamo, va ye me jî dest bi nivîsandina zarê kurdî kiriye", lê hew min bihîst ku Wecdî beg wefat kiriye.

Ez dizanim ku te ji Wecdî re bersivê nivîsandibû. Ger tu bikaribî ji kerema xwe re ji me re bi kurtî behsa wê bersivê bikî wê pir bas bibe. Ji ber ku di wê bersivê de ji bo biçûk û mezinên kurdan sîretin gelekî baş hene.

39

Belê Wecdî bi salan kurdekî kiçik e lê ji bona dawiyê hêviyeke mezin e. Çavên min Wecdî!

Eve herwekî te dil kir, min jî welê, benda te êxiste Hawarê û belav kir. Ji benda te re gelek kêfa min hat. Tu pê xeberdoxiya hemî hevsal û hogirên xwe dikî. Belê hevsal û hogirên te jî wek te difikirin, êdîn ew jî dixwazin her tiştî bi zimanê xwe hîn bibin di dibistanên kurdan de bixwînin.

Ewle be kurê min, hêdî hêdî, birêve, ew jî dê çêbibin.

Heta hingî divêt hon bi xwendina Hawarê rind hînî zimanê xwe bibin.

Belê, xebera te ye; xwenda, zana û dewlemendên kurdan, herwekî diviya bû, welê ne hatin hawar û gaziya Hawarê. Lê me hêvî heye, ew mirovên cangiran jî hêdî hêdî ji çêrandin û mezinkirina zikên xwe bigerin û her kes gor halê xwe, hin bi qelem, hin bi dirhavên xwe bêne hawara me. Lê em li hêviya wan ne sekinîn û nasekinin jî. Ji ber ko ji hezaran pêrewî re pêşrewek divêt.

Bi rastî welê ye. Mîna cenabê te jî anî zimên, hê jî gelek ji kurdan li zimanê xwe xwedî dernakevin. Tistê ecêb û kesnedî jî ew e ku kurd ji bo bidestxistina zimanê xwe serê xwe didin, derdikevin serên çiyar, di zîndanên de dirizin, lê belê bîr nabin ku ew bi xwe bî zimanê xwe bixwînin û binivîsînin.

Hê ku sohbeta me li ser teswîqê û zimanê kurdî ye, ez dixwazim bi vê ve girêdayî tu behsa Cemîlê Haco jî bikî. Cemîlê Haco jî mîna Wecdî beg ji Hawarê re nivîsek ni-  
40

Belê Wecdî bi salan kurdekî kiçik e lê ji bona dawiyê hêviyeke mezin e. Çavên min Wecdî!

Eve herwekî te dil kir, min jî welê, benda te êxiste Hawarê û belav kir. Ji benda te re gelek kêfa min hat. Tu pê xeberdoxiya hemî hevsal û hogirên xwe dikî. Belê hevsal û hogirên te jî wek te difikirin, êdîn ew jî dixwazin her tiştî bi zimanê xwe hîn bibin di dibistanên kurdan de bixwînin.

Ewle be kurê min, hêdî hêdî, birêve, ew jî dê çêbibin.

Heta hingî divêt hon bi xwendina Hawarê rind hînî zimanê xwe bibin.

Belê, xebera te ye; xwenda, zana û dewlemendên kurdan, herwekî diviya bû, welê ne hatin hawar û gaziya Hawarê. Lê me hêvî heye, ew mirovên cangiran jî hêdî hêdî ji çêrandin û mezinkirina zikên xwe bigerin û her kes gor halê xwe, hin bi qelem, hin bi dirhavên xwe bêne hawara me. Lê em li hêviya wan ne sekinîn û nasekinin jî. Ji ber ko ji hezaran pêrewî re pêşrewek divêt.

Bi rastî welê ye. Mîna cenabê te jî anî zimên, hê jî gelek ji kurdan li zimanê xwe xwedî dernakevin. Tistê ecêb û kesnedî jî ew e ku kurd ji bo bidestxistina zimanê xwe serê xwe didin, derdikevin serên çiyar, di zîndanên de dirizin, lê belê bîr nabin ku ew bi xwe bî zimanê xwe bixwînin û binivîsînin.

Hê ku sohbeta me li ser teswîqê û zimanê kurdî ye, ez

dixwazim bi vê ve girêdayî tu behsa Cemîlê Haco jî bikî.  
Cemîlê Haco jî mîna Wecdî beg ji Hawarê re nivîsek ni-  
40

vîsandibû û te ew nivîs di Hawarê de wesandibû. Pasê jî  
te mîna bersiv behsa Cemîlê Haco kiribû. Ez bawer dikim  
wê bersiva ku te dabû Cemîlê Haco jî mîna bersiva  
Wecdî beg hem di warê dîrokî de hem jî mîna belge bi  
kêrî kurdên îro were.

Cemîlê Haco kî bû?

Cemîlê Haco xortekî bîst, bîst û yek salî ye, ne ketiye tu dibistanan,  
û ber destê tu kesî de ne bi salan û ne bi mehan ne  
xwendiyê, ji zimanê xwe pê ve bi tu zimanan jî nedizaniye.

Cemîlê Haco kurdmancê pêşîn e ko xwendin û nivîsandinê  
bi elfabêya zimanê xwe û bê arîkariya zimanên din elimiye.

Çawan mamoste, bi çi awayî?

Di sala hezar û nehsed û sihî de, ji ber ko em derbasî xetê bû  
bûn hikûmetê em anî bûn Şamê û lê rûniştandi bûn.

Hûn gelek bûn?

Hingî em çendek bûn. Cemîl jî bi me re bû, tevda di taxa  
kurdan de, bi mêvanî li mala Elî axa Zilfo cih bû bûn. Şev û  
rûj nav hev de rûdiniştin.

Ez bi elfabê û zimanzanîna kurdî mijûl dibûm. Min ji her  
kesî tiştek dipirsî û herkesî ji mijûlahiya xwe re bendewar dikir.

Cemîl ji herkesî bêtir bendewarî nîşan dikir, qenc berdiket û

41

vîsandibû û te ew nivîs di Hawarê de wesandibû. Pasê jî  
te mîna bersiv behsa Cemîlê Haco kiribû. Ez bawer dikim  
wê bersiva ku te dabû Cemîlê Haco jî mîna bersiva

Wecdî beg hem di warê dîrokî de hem jî mîna belge bi kêrî kurdên îro were.

Cemîlê Haco kî bû?

Cemîlê Haco xortekî bîst, bîst û yek salî ye, ne ketiye tu dibistanan, û ber destê tu kesî de ne bi salan û ne bi mehan ne xwendiyê, ji zimanê xwe pê ve bi tu zimanan jî nedizaniye.

Cemîlê Haco kurdmancê pêşîn e ko xwendin û nivîsandinê bi elfabêya zimanê xwe û bê arîkariya zimanên din elimiye.

Çawan mamoste, bi çi awayî?

Di sala hezar û nehsed û sihî de, ji ber ko em derbasî xetê bû bûn hikûmetê em anî bûn Şamê û lê rûniştandi bûn.

Hûn gelek bûn?

Hingî em çendek bûn. Cemîl jî bi me re bû, tevda di taxa kurdan de, bi mêvanî li mala Elî axa Zilfo cih bû bûn. Şev û rûj nav hev de rûdiniştin.

Ez bi elfabê û zimanzanîna kurdî mijûl dibûm. Min ji her kesî tiştek dipirsî û herkesî ji mijûlahiya xwe re bendewar dikir.

Cemîl ji herkesî bêtir bendewarî nîşan dikir, qenc berdiket û

41

têdigehişt. Cemîl yekcar nexwenda bû. Hêj qelem ne kiri bû destê xwe. Çavên wî hîn li ser tu xêzên herfan ne geriha bûn.

Ev, ji bona min jî derheke qenc bû. Ji kurdmancekî nexwende re elfabêya xwe hîn kirin.

Hingî, di destê me de tiştekî kirî nîn bû, bivê nevê, Cemîl elfabêya kurdî bi destnivîsê hîn dibû. Min her rûj jê re çend herf nîşan dikirin û bi wan re pirsin çêdikirin.

Cemîl di nav heftekê de elfabêya kurdî xelas kiri bû. Êdin bi elfabêya zimanê xwe dikari bû her tiştî binivîsîne û destnîvîsên

rind bixwîne.

Min benda Cemîlê Haco ya bi navê "Kurd qenc in lê nezan in" xwend. Bi rastî digel ku Cemîlê Haco nexwende bû, benda wî gelekî xwes bû, analîzeke di cih de bû. Gelek xortên xwende hene> gelek kurdên xwende hene ku guh nadin zimanê xwe, heta ew zimanê xwe biçûk dibî-nûi. Gelo mirov dikare Cemîlê Haco wek nimûneyekê nîsan bide da ku xortên kurdan yê xwende jê dersê wergirin? Divêt ko Cemîlê Haco, ji bona xortên kurdan nimûne bibit, Heçî xortên kurd hene ko hej welat û miletê xwe dikin û dixwazin xidmeta wan bikin bila Cemîl bînin pêş çavên xwe û wek wî bixebitin û ji xwe re û ji miletê xwe re bifêde bibin. Tu di heqê benda wî de dikarî çi bibêjî?

Di heqê benda wî de çi bibêjim, çawan pesnê wî bidim ez jî

42

têdigehişt. Cemîl yekcar nexwenda bû. Hêj qelem ne kiri bû destê xwe. Çavên wî hîn li ser tu xêzên herfan ne geriha bûn. Ev, ji bona min jî derheke qenc bû. Ji kurdmancekî nexwende re elfabêya xwe hîn kirin.

Hingî, di destê me de tiştê kirî nîn bû, bivê nevê, Cemîl elfabêya kurdî bi destnivîsê hîn dibû. Min her rûj jê re çend herf nîşan dikirin û bi wan re pirsin çêdikirin.

Cemîl di nav heftekê de elfabêya kurdî xelas kiri bû. Êdin bi elfabêya zimanê xwe dikari bû her tiştî binivîsîne û destnivîsên rind bixwîne.

Min benda Cemîlê Haco ya bi navê "Kurd qenc in lê nezan in" xwend. Bi rastî digel ku Cemîlê Haco nexwende bû, benda wî gelekî xwes bû, analîzeke di cih de bû. Gelek

xortên xwende hene> gelek kurdên xwende hene ku guh nadin zimanê xwe, heta ew zimanê xwe biçûk dibî-nûi. Gelo mirov dikare Cemîlê Haco wek nimûneyekê nîsan bide da ku xortên kurdan yê xwende jê dersê wergirin? Divêt ko Cemîlê Haco, ji bona xortên kurdan nimûne bibit, Heçî xortên kurd hene ko hej welat û milletê xwe dikin û dixwazin xidmeta wan bikin bila Cemîl bînin pêş çavên xwe û wek wî bixebitin û ji xwe re û ji milletê xwe re bifêde bibin. Tu di heqê benda wî de dikarî çi bibêjî?

Di heqê benda wî de çi bibêjim, çawan pesnê wî bidim ez jî  
42

nizanim. Hewqas bibêjim ko heta niho tukesî sebaba berberiyê û nifaqa kurdan bi vî rengî û bi vê zelaliyê ne dîtiye, ne jî nîşan kiriye.

FIRAT CEWERÎ: Mamoste, di derheqa nijadê kurdan de carinan nêrînên cihê hene. Hin dîrokvan dibêjin ku kurd ji nijadê arî ne, hin jî dibêjin na, kurd ne ji nijadê arî ne.

Bas e, ger kurd ne ji nijadê arî bin, ew ji kîjan nijadî ne?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Belê em kurd ji nijadê arî ne. Herçî pisporên nijadan hene di vê babetê de yek in. Yanî tev de dibêjin ko kurd ji nijadê arî ne û di rohelatê nizing de wesfên arîtiyê ji hevniyardên xwe ên din çêtir û bêtir hılanîne. Mîna tu dibêjî ger kurd arîniyard bin, gelo zimanê kurdî ji ku hatiye? Ma pevgirêdaneke zimanê kurdî bi nijadê kurdan yê arîtiyê re heye?

Kurd arîziman in jî; yanî zimanê wan jî zimanekî arî ye; û bi zimanekî arî dipeyivin. O ew, yanî kurd di kaniya zimanê ariyan de rûniştî ne. Li gora hin zimanasan dergûşa zimanên



arî ew welat e ko dikeve navbera Diyarbekir û Xuristanê (Xuresan). Nîvê vî welatî Kurdistan e û nîvê din jî Ecemistan e. Belê zımanas dibêjin ko ev der welatê zımanên arî ne

43

nızanim. Hewqas bibêjim ko heta niho tukesî sebeba berberiyê û nifaqa kurdan bi vî rengî û bi vê zelaliyê ne dîtiye, ne jî nîşan kiriye.

FIRAT CEWERÎ: Mamoste, di derheqa nijadê kurdan de carinan nêrînên cihê hene. Hin dîrokvan dibêjin ku kurd ji nijadê arî ne, hin jî dibêjin na, kurd ne ji nijadê arî ne.

Bas e, ger kurd ne ji nijadê arî bin, ew ji kîjan nijadî ne?

MÎR CELADET ALÎ BEDİR-XAN: Belê em kurd ji nijadê arî ne.

Herçî pisporên nijadan hene di vê babetê de yek in. Yanî tev de dibêjin ko kurd ji nijadê arî ne û di rohelatê nizing de wesfên arîtiyê ji hevnijadên xwe ên din çêtir û bêtir hılanîne.

Mîna tu dibêjî ger kurd arînijad bin, gelo zımanê kurdî ji ku hatiye? Ma pevgirêdaneke zımanê kurdî bi nijadê kurdan yê arîtiyê re heye?

Kurd arîzıman in jî; yanî zımanê wan jî zımanekî arî ye; û bi zımanekî arî dipeyivin. O ew, yanî kurd di kaniya zımanê ariyan de rûniştî ne. Li gora hin zımanasan dergûşa zımanên arî ew welat e ko dikeve navbera Diyarbekir û Xuristanê (Xuresan). Nîvê vî welatî Kurdistan e û nîvê din jî Ecemistan e. Belê zımanas dibêjin ko ev der welatê zımanên arî ne

43

û zımanên arî tev de ji vî welatî li dinyayê belav bûne; û di nav xwe de bi çend birên bingehîn lêk vebûne: slav, latîn, german, yewnan. Mirovatiya van zımanên arî hetanî îro jî

xuya ye; rexma ko berî hezar salan ji dergûşa xwe rabûne; bi dinyayê ketine û nema vegeyane kaniya xwe. Ev mirovatî ne bi tenê di gramêr û di bastûrê de, lê di hin bêjeyan de jî eşkere dibin.

Tu dikarî ji kerema xwe re çend mîsalan bidî?

Ev in çend mîsal.

Lêv (bi kurdî) leb (bi farisî) lip (bi îngilîzî) lippe-lîbe (bi elmanî).

Pol (bi kurdî) epaule-epol (bi frensizî).

Ejnû (bi kurdî) genou-jenû (bi frensizî) bi kurdî jenû jî dibêjin.

Dilop (bi kurdî) drop (bi îngilîzî) tropfen (bi elmanî)

Nav (bi kurdî) nam (bi farisî) nom (bi frensizî) name (bi îngilîzî) name (bi elmanî) onoma (bi yewnanî). ... Ev mîsalên ha bi tenê ew bêje ne ko bi derbekê re têne

bîrê. Lê heke mirov zimanê kurdî û zimanên din ên arî danîn ber hev û hûr li wan mêze kir wê bête dîtî ko mirovatiya van zimanan digel zimanê me gelek kûr û nîzing e. Ji xwe herçî kurdî û farisî, ewçend nîzingî hev in ko ev her du ziman wek du zarên zimanekî dikarin bêne hesibandin. Bi ferqa ko farisîyê ji kurdiyê bêtir hikmê erebiyê xwariye û di bin tehsîra wê de maye.

44

û zimanên arî tev de ji vî welatî li dinyayê belav bûne; û di nav xwe de bi çend birên bingehîn lêk vebûne: slav, latîn, german, yewnan. Mirovatiya van zimanên arî hetanî îro jî xuya ye; rexma ko berî hezar salan ji dergûşa xwe rabûne; bi dinyayê ketine û nema vegeyane kaniya xwe. Ev mirovatî ne bi tenê di gramêr û di bastûrê de, lê di hin bêjeyan de jî

eşkere dibin.

Tu dikarî ji kerema xwe re çend mîsalan bidî?

Ev in çend mîsal.

Lêv (bi kurdî) leb (bi farisî) lip (bi îngilîzî) lippe-lîbe (bi elmanî).

Pol (bi kurdî) epaule-epol (bi frensizî).

Ejnû (bi kurdî) genou-jenû (bi frensizî) bi kurdî jenû jî dibê-  
jin.

Dilop (bi kurdî) drop (bi îngilîzî) tropfen (bi elmanî)

Nav (bi kurdî) nam (bi farisî) nom (bi frensizî) name (bi îngilîzî)  
name (bi elmanî) onoma (bi yewnanî). ... Ev mîsalên ha bi tenê ew  
bêje ne ko bi derbekê re têne

bîrê. Lê heke mirov zimanê kurdî û zimanên din ên arî danîn  
ber hev û hûr li wan mêze kir wê bête dîtin ko mirovatiya  
van zimanan digel zimanê me gelek kûr û nîzing e. Ji xwe  
herçî kurdî û farisî, ewçend nîzingî hev in ko ev her du ziman  
wek du zarên zimanekî dikarin bêne hesabandin. Bi ferqa  
ko farisîyê ji kurdiyê bêtir hikmê erebiyê xwariye û di bin  
tehsîra wê de maye.

44

FIRAT CEWERÎ: Tistekî her tim bala min kişandiye; ew jî  
nav in. Navên endamên gel û neteweyên cihê ne. Milet  
bi navên xwe têne naskirin. Carinan nav bi qasî zimên ji  
bo nasnava neteweyî girîng e. Loma jî gelek caran serdestên  
kurdan navên kurdî li kurdan qedexe kirine û navên  
xwe li wan kirine. Bi taybetî jî pistî avakirina cumhuriyeta  
Tirkiyeyê û fikra asîmîlekirina kurdan re em dibê-  
nin ku pasnavên kurdan bi carekê ve tête guhertin û di  
şûna wê de pasnavên tirkî li kurdan tête kirin. Herweha

ji berdêla navên kurdî jî navên tirkî û erebî li kurdan hatine kirin û tistê ku ez li ber dikevim gelek kurd bi xwe jî dilê xwe dibijînin navên biyanî û dev ji navên kurdî berdidin.

Nizanim gelo cenabê te di vê derheqê de çi dibêje?

MÎRCELADETALÎBEDIR-XAN: Kurdmancin hene hetanî îro jî, navine biyanî, navên Emro û Zeydon, li zaroyên xwe dikin; û gava mirov ji wan dipirse te çire navekî kurdî li keç an kurê xwe ne kir?

Hin dibêjin: maliyan ev nav eciband, ji lewre me navê keça xwe kir "Elya" an navê kurê xwe kir "Xeftan". Ji wan re tu gotin nîne. Mêrên ko bi malîyên xwe nikarin bivê nevê ewê bi me bikarin!...

Lê hinên din dibêjin: Ma navên kurdmancî hene? Hebin jî  
45

FIRAT CEWERÎ: Tistekî her tim bala min kişandiye; ew jî nav in. Navên endamên gel û neteweyên cihê ne. Milet bi navên xwe têne naskirin. Carinan nav bi qasî zimên ji bo nasnava neteweyî girîng e. Loma jî gelek caran serdestên kurdan navên kurdî li kurdan qedexa kirine û navên xwe li wan kirine. Bi taybetî jî pistî avakirina cumhuriyeta Tirkîyê û fikra asîmîlekirina kurdan re em dibînin ku pasnavên kurdan bi carekê ve têtê guhertin û di şûna wê de pasnavên tirkî li kurdan têtê kirin. Herweha ji berdêla navên kurdî jî navên tirkî û erebî li kurdan hatine kirin û tistê ku ez li ber dikevim gelek kurd bi xwe jî dilê xwe dibijînin navên biyanî û dev ji navên kurdî berdidin. Nizanim gelo cenabê te di vê derheqê de çi dibêje?

MÎRCELADETALÎBEDIR-XAN: Kurdmancin hene hetanî îro jî,

navine biyanî, navên Emro û Zeydon, li zaroyên xwe dikin;  
û gava mirov ji wan dipirse te çire navekî kurdî li keç an kurê  
xwe ne kir?

Hin dibêjin: maliyan ev nav eciband, ji lewre me navê ke-  
ça xwe kir "Elya" an navê kurê xwe kir "Xeftan". Ji wan re tu  
gotin nîne. Mêrên ko bi maliyên xwe nikarin bivê nevê ewê  
bi me bikarin!...

Lê hinên din dibêjin: Ma navên kurdancî hene? Hebin jî  
45

em bi wan nizanin. Zûka em li wan vedigerînin û dibêjin:  
Belê navên kurdancî hene û ew gelek çeleng û spehî ne.  
Ji her du tofên jorîn pê ve tofeke ecêb û xerîb heye. Xelkê wê  
tofê kurdine welatparêz û miletperwer in; bi navên kurdancî  
dizanin û pend û şîretan li xelkê dikin û dibêjin: Navine  
kurdî li zaroyên xwe bikin. Lê bi xwe navine biyanî li  
zaroyên xwe dikin.

Çawan mamoste, ma mînakên berbiçav hene?

Do ne pê Xwedê ji xelkê wê tofê yekî re kurek da bû. Me jê  
pirsî; te çi nav li kurê xwe kir? Camêr hinek sekinî; heçko dida  
eqilê xwe û di bîra xwe de li navê kurê xwe digeriya. Devê  
xwe bir û anî û paşê bi dengêkî nizim mirmirand û got: "Me  
navê Hesên Besrî lê kiriye; lê di nav xwe de em jê re Gurgîn  
dibêjin". Di nav xelkê de jî we jê re Gurgîn bigota ma eybek  
mezin bû?

Te berî kêliyê got ku tofek heye bi maliyên xwe nikarin.  
Yanî di malê de maliyên wan serdest in û biryarên  
hundurîn ew didin. Tiştê ez dizanim jinên kurdan di warê  
parastina kultur û zimanê kurdî de, di warê parastina

folklora kurdî de ji mêrên kurdan jî çêtir in. Gelo ev çi celeb jin in ku zora mêrê xwe dibin û ji berdêla navên kurdî navên biyanî li zarokên xwe dikin?

Yên ko bi malîyên xwe nikarin bawer bikin malîyên wan ne kurdmanc in. Êdî dem e ko em kurdmanc jî guh bidin xwî-46

em bi wan nizanin. Zûka em li wan vedigerînin û dibêjin: Belê navên kurdmancî hene û ew gelek çeleng û spehî ne. Ji her du tofên jorîn pê ve tofeke ecêb û xerîb heye. Xelkê wê tofê kurdine welatparêz û miletperwer in; bi navên kurdmancî dizanin û pend û şîretan li xelkê dikin û dibêjin: Navine kurdî li zaroyên xwe bikin. Lê bi xwe navine biyanî li zaroyên xwe dikin.

Çawan mamoste, ma mînakên berbiçav hene?

Do ne pêr Xwedê ji xelkê wê tofê yekî re kurek da bû. Me jê pirsî; te çi nav li kurê xwe kir? Camêr hinek sekinî; heçko dida eqilê xwe û di bîra xwe de li navê kurê xwe digeriya. Devê xwe bir û anî û paşê bi dengê nîzîm mîrmîrand û got: "Me navê Hesên Besrî lê kiriye; lê di nav xwe de em jê re Gurgîn dibêjin". Di nav xelkê de jî we jê re Gurgîn bigota ma eybek mezin bû?

Te berî kêliyê got ku tofek heye bi malîyên xwe nikarin. Yanî di malê de malîyên wan serdest in û biryarên hundurîn ew didin. Tiştê ez dizanim jinên kurdan di warê parastina kultur û zimanê kurdî de, di warê parastina folklora kurdî de ji mêrên kurdan jî çêtir in. Gelo ev çi celeb jin in ku zora mêrê xwe dibin û ji berdêla navên kurdî navên biyanî li zarokên xwe dikin?

Yên ko bi maliyên xwe nikarin bawer bikin maliyên wan ne kurdmanc in. Êdî dem e ko em kurdmanc jî guh bidin xwî-  
46

na xwe û xwînên kê m têkilî xwîna xwe a pak nekin.

Tu dixwazî çî bibêjî mamoste? Ma xwîna kurdan ewqasî  
ji xwîna xelkên din paktir e?

Belê di rohelatê nîzing de û di nav hevnijadên me de tu milletên arî xwîna xwe bi qasî me pak hilnaniye. Ji niho û pê de jî divêt em jî guh bidin xwîna xwe û paqijiya nijadê xwe ji xirabî û kêmasiyê biparêzin; nemaze ji têkilbûna xwîna milletên nearî. . . Ji ber ko herwekî pêşiyên me gotine "xwîn nabe av" û ew rojekê xwe şanî dide; heqê xwe dixwaze û vedigere kaniya xwe. Ma ne heyf e ko mirov rabe şîlanê li ser dara gulê biteimîne.

Tiştê ku ez ji gotinên te derdixim, tu dibêjî bila xortên kurdan bi keçên kurdan re bizewicin. Tu vê yekê jî bi parastina xwîna kurdan, bi parastina zimanê kurdî ve girê didî.

Anîna jinên biyanî ji milê din kurdine nekurdziman ditîne pê. Ji ber ko zaro ne li ber destên bavên xwe lê li ber destên diyên xwe xeber didin. Ev zaro midekî kurdine nekurdziman in; lê piştî nifşekî kurdaniya xwe yekcar winda dikin û dibin ji wî milletê ko bi zimanê wî dipeyivin. Carina jî ew millet dijminê kurd e.

Tehsîra jinan ne bi tenê di zimên de ye. Adet, ziman, rabûn û rûniştin û her texlît ayînên miletan bi destê jinan têne hilanîn. Ji ber ko jin ji mêran bêtir bi boriyê ve girêdayî ne û

47

na xwe û xwînên kê m t êkilî xwîna xwe a pak nekin.

Tu dixwazî çî bibêjî mamoste? Ma xwîna kurdan ewqasî  
ji xwîna xelkên din paktir e?

Belê di rohelatê nîzing de û di nav hevniyadên me de tu milletên  
arî xwîna xwe bi qasî me pak hilnaniye. Ji niho û pê de  
jî divêt em jî guh bidin xwîna xwe û paqijiya nijadê xwe ji  
xirabî û kêmasiyê biparêzin; nemaze ji t êkilbûna xwîna milletên  
nearî. . . Ji ber ko herwekî pêşiyên me gotine "xwîn nabe  
av" û ew rojekê xwe şanî dide; heqê xwe dixwaze û vedigere  
kaniya xwe. Ma ne heyf e ko mirov rabe şîlanê li ser dara gulê  
biteimîne.

Tiştê ku ez ji gotinên te derdixim, tu dibêjî bila xortên  
kurdan bi keçên kurdan re bizewicin. Tu vê yekê jî bi  
parastina xwîna kurdan, bi parastina zimanê kurdî ve girê  
didî.

Anîna jinên biyanî ji milê din kurdine nekurdziman ditîne  
pê. Ji ber ko zaro ne li ber destên bavên xwe lê li ber destên  
diyên xwe xeber didin. Ev zaro midekî kurdine nekurdziman  
in; lê piştî nifşekî kurdaniya xwe yekcar winda dikin û  
dibin ji wî milletê ko bi zimanê wî dipeyivin. Carina jî ew  
milet dijminê kurd e.

Tehsîra jinan ne bi tenê di zimên de ye. Adet, ziman, rabûn  
û rûniştin û her texlît ayînên miletan bi destê jinan têne  
hilanîn. Ji ber ko jin ji mêran bêtir bi boriyê ve girêdayî ne û  
47

dan û standina jinan bi biyaniyan re kê m e. Jin ew peresto ye ko di  
mala xwe de, zar û zêçên wê lê werhatî,  
di ber heykela pêşiyên de heyran û heşmetkar rûniştî, lê



fedikere; nav di xwe dide û deriyê xwe bi çilmêrekî xurt, li rûyê her tiştê xerîb û ne jê digire; û tê de li dijminekî nedîbar diqewimîne. Ew dijminê nedîbar adet, ziman û ayînên milletên din in. Ew di ber mala wê re digerin; diçin wî serî, tên vî serî, û heke firsend bi dest ket, teqşîr nakin, xwe nadin paş û dikevinê.

Çawan? Tu dikarî ji kerema xwe re hinekî din jî vekî?

Gava mirov li berîvanan fedikire isbata gotinên me di wan de dibîne. Herçî mêr di bin egal û kefiyên dirêj de winda bûne. Lê herçî jin hetanî îro jî belgihên xwe ên delal ne guhertine û bi kofiyên xwe ên rengereng di beriyên bêdar û belg de wek kulîlkên zozanan ter û taze, serbilind û serefraz digerin.

Di nav berîvanan de dîsan jin in ko navên kurdmancî hilanîne.

Navên mêrên wan ji hin awartan pê ve tev de navine biyanî ne; navên Emro û Zeydon in.

Tu dikarî ji kerema xwe re çend mînakan ji navên mêr û jinan bidî?

Navên mêran: Ado, Agir, Bado, Babîk, Balo, Baqoq, Barano, Baro, Bazo, Behlo, Behrem, Behrûz, Belo, Bengî, Beno, Berxo, Bexşo, Cangîr, Cango, Cebo, Cemşîd, Cano, Dara,

48

dan û standina jinan bi biyaniyan re kêm e. Jin ew peresto ye ko di mala xwe de, zar û zêçên wê lê werhatî, di ber heykela pêşiyên de heyran û heşmetkar rûniştî, lê fedikere; nav di xwe dide û deriyê xwe bi çilmêrekî xurt, li rûyê her tiştê xerîb û ne jê digire; û tê de li dijminekî nedîbar diqewimîne. Ew dijminê nedîbar adet, ziman û ayînên milletên

din in. Ew di ber mala wê re digerin; diçin wî serî, tên vî serî, û heke firsend bi dest ket, teqşîr nakin, xwe nadin paş û dikevinê.

Çawan? Tu dikarî ji kerema xwe re hinekî din jî vekî?

Gava mirov li berîvanan fedikire isbata gotinên me di wan de dibîne. Herçî mêr di bin egal û kefiyên dirêj de winda bûne. Lê herçî jin hetanî îro jî belgihên xwe ên delal ne guhertine û bi kofiyên xwe ên rengereng di beriyên bêdar û belg de wek kulîlkên zozanan ter û taze, serbilind û serefraz digerin.

Di nav berîvanan de dîsan jin in ko navên kurdmancî hilanîne. Navên mêrên wan ji hin awartan pê ve tev de navine biyanî ne; navên Emro û Zeydon in.

Tu dikarî ji kerema xwe re çend mînakên ji navên mêr û jinan bidî?

Navên mêran: Ado, Agir, Bado, Babîk, Balo, Baqoq, Barano, Baro, Bazo, Behlo, Behrem, Behrûz, Belo, Bengî, Beno, Berxo, Bexşo, Cangîr, Cango, Cebo, Cemşîd, Cano, Dara,  
48

Delo, Derbas, Dermo, Dilawer, Dilo, Dimdim, Dirbo, Dîbo, Mistê. . . Navên jinan: Ano, Arê, Aşê, Avê, Axê, Beso, Beybûn, Beyo,  
Bêzar, Bêzê, Bêzo, Canê, Delal, Derdê, Dilê, Dilşa, Dirê, Dîlber, Eco. . . Di gelek zimanan de navin hene ku hem li jinan û hem

jî li mêran têne kirin. Nizanim gelo di kurdî de jî navên welê hene?

Navin hene ko li jinan û mêran bi hev re dikan.

Kîjan nav?

Herwekî; "Baran, Boz, Can, Keser, Perîşan, Şeng, Şêr, Xem, Şîrîn h. d.

Heke ev nav li mêran hatine kirin bi tewanga nêr yahî bi "o" yê têne tewandin û gava wan li jinan dikin ew bi tewanga mê yanî bi "ê" yê têne tewandin. Mîna: Şêro-Şêrê. XemoXemê. Dilo-Dilê. Perîşano-Perîsanê.

Le belê mamoste li hin deverên Kurdistanê hin tewangên li derveyî qeydeyan jî hene. Yani navên mêran bi tewanga mê, hin navên jinan jî bi tewanga nêr têne tewandin.

Ez bawer dikim cenabê te jî ev destnîsan kiribû. Gelo hin mînakên ku têne bîra te hene?

Navên mêran: Bûbê, Henê, Potê, Mistê, Hovnê.

49

Delo, Derbas, Dermo, Dilawer, Dilo, Dimdim, Dirbo, Dîbo, Mistê. . . Navên jinan: Ano, Arê, Aşê, Avê, Axê, Beso, Beybûn, Beyo,

Bêzar, Bêzê, Bêzo, Canê, Delal, Derdê, Dilê, Dilşa, Dirê, Dîlber, Eco. . . Di gelek zimanan de navin hene ku hem li jinan û hem

jî li mêran têne kirin. Nizanim gelo di kurdî de jî navên welê hene?

Navin hene ko li jinan û mêran bi hev re dikin.

Kîjan nav?

Herwekî; "Baran, Boz, Can, Keser, Perîşan, Şeng, Şêr, Xem, Şîrîn h. d.

Heke ev nav li mêran hatine kirin bi tewanga nêr yahî bi "o" yê têne tewandin û gava wan li jinan dikin ew bi tewanga

mê yanî bi "ê"yê têne tewandin. Mîna: Şêro-Şêrê. XemoXemê.  
Dilo-Dilê. Perîşano-Perîsanê.

Le belê mamoste li hin deverên Kurdistanê hin tewangên  
li derveyê qeydeyan jî hene. Yani navên mêran bi tewanga  
mê, hin navên jinan jî bi tewanga nêr têne tewandin.

Ez bawer dikim cenabê te jî ev destnîsan kiribû. Gelo  
hin mînakên ku têne bîra te hene?

Navên mêran: Bûbê, Henê, Potê, Mistê, Hovnê.

49

Navêh jinan: Ano, Besö, Beyo, Bêzo, Eco, Finco, Seno, Hafo,  
Nazo, Xeco, Şeno, Şerbo, Şêro.

Ji milê din naven mêran bin jinan bin carina bi her du tewangan  
têne tewandin.

Oco Ûcê Xecê Xeco

Bûbo Bûbê Bêzê Bêzo

Misto Mistê Fincê Finco

Besê Beso Nazê Nazo

Sêrê Sêro Xanê Xano

Gelo ji vê yekê re tu qeyde nînin?

Gelek eşkere ye ko ev tişt ji qeyda gelemper der e; û wî tu  
qeyda xweser nîne.

Gelo tu sebebeke bingehîn jê re heye?

Bawer bikin tu sebeba bingehîn jê re nîne. Bi tenê ji bo delaliyê  
an ji bo kêmqedriyê li keçan bi "o" yê li kuran bi "ê" yê  
deng dikin. Herwekî li şûna ko "keçê" bibêjin; dibêjin "ke-  
ço" û ji yekê re ko navê wî "Mistefa" ye li şûna ko bibêjin  
"Misto" dibêjin "Mistê".

Herwekî me got "ê" û "o" yên ko dikevin paşya navan tewang

in; tewangên bankirinê ne. Ji lewra diviya bû her gav  
ne bi Wan ve bibin; û bi tenê di dema bankirinê de bi wan  
bikevin. Lê ew tewang bi awakî welê bi sernavên xwe ve bû-  
ne ko jê tucaran venaqetin. Digel vê hindê kurdmancên ko  
di zmên de mihafezekar in guh didin vê ferqê û nabêjin  
50

Navêh jinan: Ano, Besö, Beyo, Bêzo, Eco, Finco, Seno, Hafo,  
Nazo, Xeco, Şeno, Şerbo, Şêro.

Ji milê din naven mêran bin jinan bin carina bi her du tewangan  
têne tewandin.

Oco Ûcê Xecê Xeco

Bûbo Bûbê Bêzê Bêzo

Misto Mistê Fincê Finco

Besê Beso Nazê Nazo

Sêrê Sêro Xanê Xano

Gelo ji vê yekê re tu qeyde nînin?

Gelek eşkere ye ko ev tişt ji qeyda gelemper der e; û wî tu  
qeyda xweser nîne.

Gelo tu sebebeke bingehîn jê re heye?

Bawer bikin tu sebaba bingehîn jê re nîne. Bi tenê ji bo delaliyê  
an ji bo kêmqedriyê li keçan bi "o" yê li kuran bi "ê" yê  
deng dîkin. Herwekî li şûna ko "keçê" bibêjin; dibêjin "ke-  
ço" û ji yekî re ko navê wî "Mistefa" ye li şûna ko bibêjin  
"Misto" dibêjin "Mistê".

Herwekî me got "ê" û "o" yên ko dikevin paşîya navan tewang  
in; tewangên bankirinê ne. Ji lewra diviya bû her gav  
ne bi Wan ve bibin; û bi tenê di dema bankirinê de bi wan  
bikevin. Lê ew tewang bi awakî welê bi sernavên xwe ve bû-

ne ko jê tucaran venaqetin. Digel vê hindê kurdmancên ko di zmên de mihafezekar in guh didin vê ferqê û nabêjin

50

51

"Gulê hat" lê dibêjin "Gul hat" û bi tenê di dema bankirinê de dibêjin "Gulê! were".

Tu dibêjî ku "o" û "ê" tewangên bangkirinê ne. Gelo ev tewang qet di sûna tewangên adetî de jî nayên xebitandin? Carinan van tewangan li şûna tewangên adetî jî dixebitînin. Mesela em navê "Mîş" bibin. Ev navê ha, navekî mêran e; ji lewre diviya bû bi "î" yê bihata tewandin û li gora qeyda gelemper diviya bû mirov bibêje: "Mîş hat, Mîşî got, Mîşo were".

Lê herwekî me got "o" yê dixin şûna "î" yê û dibêjin:

"Mîş hat, Mîşo got, Mîşo were". Wek netîceke vê qeydê navên ko bi "o" yê diqedin bi tu awayî nayine tewandin. Ji lewçre mirov dikare bibêje "Bozên got" lê nikare bibêje "Hêco got" divêt bibêje "Haco got" . Çima?

Ji ber ko navê "Haco" bi "o" yê tamam dibe.

Ez dixwazim vegerim ser bingeh an jî koka navan. Mîna cenabê te jî pê dizane, gelek navên kurdl bi eslê xwe ne bi kurdî ne, ji zimanin din ketine kurdî. Gelo ev qeydeya ku tu behs dikî ji bo wan navan jî derbas dibe?

Heye ko . . . navin peyda dibin ko di eslê xwe de ne bi kurdî ne; lê kurdmancan ew bi awakî welê xebitandine ko dirfê za-5\*

"Gulê hat" lê dibêjin "Gul hat" û bi tenê di dema bankirinê de dibêjin "Gulê! were".

Tu dibêjî ku "o" û "ê" tewangên bangkirinê ne. Gelo ev

tewang qet di sûna tewangên adetî de jî nayên xebitandin?  
 Carinan van tewangan li şûna tewangên adetî jî dixebitînin.  
 Mesela em navê "Mîş" bibin. Ev navê ha, navekî mêran e; ji  
 lewre diviya bû bi "î" yê bihata tewandin û li gora qeyda gelemper  
 diviya bû mirov bibêje: "Mîş hat, Mîşî got, Mîşo were".  
 Lê herwekî me got "o" yê dixin şûna "î" yê û dibêjin:  
 "Mîş hat, Mîşo got, Mîşo were". Wek netîceke vê qeydê navên  
 ko bi "o" yê diqedin bi tu awayî nayine tewandin. Ji lewçre  
 mirov dikare bibêje "Bozên got" lê nikare bibêje "Hêco  
 got" divêt bibêje "Haco got" . Çima?  
 Ji ber ko navê "Haco" bi "o" yê tamam dibe.  
 Ez dixwazim vegerim ser bingeh an jî koka navan. Mîna  
 cenabê te jî pê dizane, gelek navên kurdî bi eslê xwe ne  
 bi kurdî ne, ji zimanin din ketine kurdî. Gelo ev qeydeya  
 ku tu behs dikî ji bo wan navan jî derbas dibe?  
 Heye ko . . . navin peyda dibin ko di eslê xwe de ne bi kurdî  
 ne; lê kurdmancan ew bi awakî welê xebitandine ko dirfê za-  
 5\*

rê me bi wan ketiye û ew hatine kurdandin. Di zimên de her  
 tiştê kurdandî bi kurdî ye û ew yê me ye.

FIRAT CEWERÎ: Mamosete, bi destûra te be ez dixwazim di  
 derheqa alfabê de du-sê pirsan bipirsim. Gelo alfabeya  
 kurdî ji çend herfan pêk hatiye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Elfabêya kurdî ji sih û yek herfan  
 hevedudanî ye. Herf di dengdayiyê de du texlît in: dengdêr  
 û dengdar.

Dengdêr ew herf e ko dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe  
 derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ko dixwedeng e, lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê kurdî de çend dengdêr hene?

Di zimanê kurdî de heşt dengdêr hene.

53

rê me bi wan ketiye û ew hatine kurdandin. Di zimên de her tiştê kurdandî bi kurdî ye û ew yê me ye.

FIRAT CEWERÎ: Mamosete, bi destûra te be ez dixwazim di derheqa alfabê de du-sê pirsan bipirsim. Gelo alfabeya kurdî ji çend herfan pêk hatiye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Efabêya kurdî ji sih û yek herfan hevedudanî ye. Herf di dengdayiyê de du texlît in: dengdêr û dengdar.

Dengdêr ew herf e ko dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ko dixwedeng e, lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê kurdî de çend dengdêr hene?

Di zimanê kurdî de heşt dengdêr hene.

53

FIRAT CEWERÎ: Tistê ku ez dizanim gava te bingehê alfabeya xwe danî, te nexwest tu zêde ji alfabeya tirkî bi dûr bikevî.

Lê belê te bi tîpa (i) û (î)yê xwe ji alfabeya tirkî bi dûr xist. Îro hin kurd li ser van tîpan li hev nakin. Ev nelihevkirina wan jî, ji bo xwendevanên kurd serêsiyekê bi xwe re tîne. Gelo çima tu bi van herdu tîpan ji alfabeya tirkî bi dûr ketî?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Gora destûrên me ên bingehî,



ko ji bona çêkirina elfabeya xwe me pêkanî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabeya

tirkan dûr mekevin.

Li hire, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk (i)ya kin bi (i)ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i)ya kin bi (i)ke bê niqte û ya drêj bi (i)ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko (i)ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş û paşê hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistina wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyar û ji bona veqetandina (i)ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketiye rex an nava wan- ser herfa ko berî (i)yê dihat îşaretek berdidan.

Bê şik e ko me nikarî bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin. Jû pê ve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zimanan cihê ne, isûlên dengdêrên kurdî bivê neyê ji isûlê tirkan dûr ketiye.

54

FIRAT CEWERÎ: Tistê ku ez dizanim gava te bingehê alfabeya xwe danî, te nexwest tu zêde ji alfabeya tirkî bi dûr bikevî.

Lê belê te bi tîpa (i) û (î)yê xwe ji alfabeya tirkî bi dûr xist. Îro hin kurd li ser van tîpan li hev nakin. Ev nelihevkirina wan jî, ji bo xwendevanên kurd serêsiyekê bi xwe re tîne. Gelo çima tu bi van herdu tîpan ji alfabeya tirkî bi dûr ketî?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabeya xwe me pêkanî û di pêşiya vê

bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabeya

tirkan dûr mekevin.

Li hire, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk (i)ya kin bi (i)ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i)ya kin bi (i)ke bê niqte û ya drêj bi (i)ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko (i)ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş û paşê hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistina wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona veqetandina (i)ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketiye rex an nava wan- ser herfa ko berî (i)yê dihat îşaretek berdidan.

Bê şik e ko me nikarî bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin. Jû pê ve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zimanan cihê ne, isûlên dengdêrên kurdî bivê neyê ji isûlê tirkan dûr ketiye.

54

Tinê di heqê vê (i)yê de tiştêkî din heye. Dibêjin ko di zarê nîvro de ev (i)ya ha carinan zravtir têtê xwendin. Nemaze di izafetan de. Ji ber ko di zarê nîvro de mê û nêr ne mane, jê ketine û izafeta erebî yekcar xwe xistiye nav wî zarî.

Wekî niho, di zarê bakurî de, gora mê û nêr bûna pirs û navan du şikl hene:

Kurê Remo Keça Remo

Kurê di Remo Keça di Remo

Lê di zarê nîvro de, ji ber ko mê û nêr nînin, ev terkîbên ha ik izafetê têne gotin.

Kuri Remo Keçi Remo

Ev izafetên hanî di zarê bakurî de jî peyda dibin, lê ne di zimanê axaftin û nivîsandina adetî de, lê belê di zimanê dabê (edebiyat)a kevn de, nemaze di şihran de ko bi wezna erûzê hatine nivîsandin.

Ev di zimanê bakurî de çawa ye mamoste?

Di zimanê bakurî de ev izafetên ha wek pirs û terkîbînen biyanî ne, di nav dîwanan de mane û ne ketine zimanê xelkî.

Bi elfabêya me û gora bilêvkirina kurdiya xwerû, herwekî xelk bilêv dikin ev misra divêt holê bête nivîsandin.

(Begzade ye yek ji nesli-mîran)

55

Tinê di heqê vê (i)yê de tişteki din heye. Dibêjin ko di zarê nîvro de ev (i)ya ha carinan zravtir tête xwendin. Nemaze di izafetan de. Ji ber ko di zarê nîvro de mê û nêr ne mane, jê ketine û izafeta erebî yekcar xwe xistiye nav wî zarî.

Wekî niho, di zarê bakurî de, gora mê û nêr bûna pirs û navan du şikl hene:

Kurê Remo Keça Remo

Kurê di Remo Keça di Remo

Lê di zarê nîvro de, ji ber ko mê û nêr nînin, ev terkîbên ha ik izafetê têne gotin.

Kuri Remo Keçi Remo

Ev izafetên hanî di zarê bakurî de jî peyda dibin, lê ne di zimanê axaftin û nivîsandina adetî de, lê belê di zimanê dabê (edebiyat)a kevn de, nemaze di şihran de ko bi wezna erûzê hatine nivîsandin.

Ev di zimanê bakurî de çawa ye mamoste?

Di zimanê bakurî de ev izafetên ha wek pirs û terkîbinen biyanî ne, di nav dîwanan de mane û ne ketine zimanê xelkî.

Bi elfabêya me û gora bilêvkirina kurdiya xwerû, herwekî xelk bilêv dikin ev misra divêt holê bête nivîsandin.

(Begzade ye yek ji nesli-mîran)

55

Navbera (nesli) û (mîran) me xêzkokek êxist, pê şiklê wî ê biyanî xuya dibe.

Digel vê hindê mirov nikare bibêje ko (i)yên izafetên erebî hergav wek (i)yên kurdî kin û stûr têne xwendin. Ji ber ko di wezna erûzê de ji bona destxistina ahengî ev (i)yên ha ko (-)a izafetê ne carinan drêj jî têne xwendin.

Lê heke di zarê nîvro de (i)yin hene ko ji (i)ya adetî zravtir têne bilêvkirin ev zravî ne ji guhêrîna cihderka deng, belko ji guhêrîna rengê dengî tête pê ko nayê nîşan kirin.

Ji xwe di zimanê me û di her zimanî de dengdêr û tevayiya herfan gora zar, zaravan kêr û zêde, bi ferqinan têne bi lêv kirin, zrav û stûr dibin, herwekî di birê xwe de bête gotin.

FIRAT CEWERÎ: Mamoste, tê gotin ku zimanê kurdî ji çend zaran pêk hatiye. Gelo zar çî ye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Ziman bi gelemperî bi zaran lêk vedibin. Di yek zimanî de yek caran du sê zar peyda dibin. Ev zar carina ji hev gelekî bi ferq in. Ewçend ko gramê-ra wan ji hev cida ye. Digel vê hindê ew zarên yek zimanî têne hesabandin. Wek zarên zimanê me.

Zar bi xwe tê çî maneyê?

56

Navbera (nesli) û (mîran) me xêzkokek êxist, pê şiklê wî ê

biyanî xuya dibe.

Digel vê hindê mirov nikare bibêje ko (i)yên izafetên erebî hergav wek (i)yên kurdî kin û stûr têne xwendin. Ji ber ko di wezna erûzê de ji bona destxistina ahengî ev (i)yên ha ko (-)a izafetê ne carinan drêj jî têne xwendin.

Lê heke di zarê nîvro de (i)yin hene ko ji (i)ya adetî zravtir têne bilêvkirin ev zravî ne ji guhêrîna cihderka deng, belko ji guhêrîna rengê dengî tête pê ko nayê nîşan kirin.

Ji xwe di zimanê me û di her zimanî de dengdêr û tevayiya herfan gora zar, zaravan kêr û zêde, bi ferqinan têne bi lêv kirin, zrav û stûr dibin, herwekî di birê xwe de bête gotin.

FIRAT CEWERÎ: Mamoste, tê gotin ku zimanê kurdî ji çend zaran pêk hatiye. Gelo zar çi ye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Ziman bi gelemperî bi zaran lêk vedibin. Di yek zimanî de yek caran du sê zar peyda dibin. Ev zar carina ji hev gelekî bi ferq in. Ewçend ko gramê-ra wan ji hev cida ye. Digel vê hindê ew zarên yek zimanî têne hesabandin. Wek zarên zimanê me.

Zar bi xwe tê çi maneyê?

56

57

Zar bi mana gotinê ye. Ma em bi xwe nabcjin "Ev zar ji devê min derneketiye" an "filankes çi mirovekî zarxweş e".

Di zîmanê me de çend zarên bingehîn hene?

Di zimanê me de sê zarên bingehîn hene.

Ew kîjan in mamoste?

Zarê kurdmancî, zarê dumilî û zarê soranî.

Ji bilî zar, zarava jî tête bi kar anîn. Gelo tu ferq di navbera

zar û zarava de heye?

Herçî zar di nav xwe de bi zaravan leva dibin. Ferqa zaravan ne ewçend mezin e. Ev ferq tucaran nagehe heta gramêrê.

Ferq di bêjan û di awayê gotin û bilêvkerinê de ye.

Gelo di senifandina zimanê nivîskî de zaravayek dikare bibe bingehê isûla nivîsandinê?

Di senifandina zimanê nivîskî de zaravayek nikare bibe bingehê isûlê nivîsandinê. Lê di pêkanîna zimanê nivîskî de her zarava bi hêmanên xwe ên rast û xwerû-hilanî hevkarîyê dike û bi kêr têt.

Ji lewre ji bo sehkirina zimên li zaravayên wî zimanî hûr dibin û wan zaravan herwekî ji devên xwedîyan dertên tesbît dikin.

58

Zar bi mana gotinê ye. Ma em bi xwe nabçjin "Ev zar ji devê min derneketiye" an "filankes çî mirovekî zarxweş e".

Di zîmanê me de çend zarên bingehîn hene?

Di zîmanê me de sê zarên bingehîn hene.

Ew kîjan in mamoste?

Zarê kurdmançî, zarê dumilî û zarê soranî.

Ji bilî zar, zarava jî têtê bi kar anîn. Gelo tu ferq di navbera zar û zarava de heye?

Herçî zar di nav xwe de bi zaravan leva dibin. Ferqa zaravan ne ewçend mezin e. Ev ferq tucaran nagehe heta gramêrê.

Ferq di bêjan û di awayê gotin û bilêvkerinê de ye.

Gelo di senifandina zimanê nivîskî de zaravayek dikare bibe bingehê isûla nivîsandinê?

Di senifandina zimanê nivîskî de zaravayek nikare bibe bingehê

isûlê nivîsandinê. Lê di pêkanîna zimanê nivîskî de her zarava bi hêmancn xwe ên rast û xwerû-hilanî hevkarîyê dike û bi kêr têt.

Ji lewre ji bo sehkirina zimên li zaravayên wî zimanî hûr dibin û wan zaravan herwekî ji devên xwedîyan dertên tesbît dîkin.

58

Lê te bi xwe kîjan rê hîlbijartîye?

Me jî dil heye em jî bidin pey vê qeydê.

FIRATCEWERÎ: Mîna tê zanîn ziman yek ji faktorên miletbûnê ye. Faktoreke din jî yekîtiya erdê ye. Ji vê re jî welat tê gotin. Nizanim gelo cenabê te dikare welêt çawan tarîf bike?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Welat erdê bav û kalên me ye. Welat ew diyar e ko pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitî ne û li wê mirine.

Xelkê welatekî çiyê hev in?

Xelkê welatekî, welatîyên hev in... Xelkê welatekî brayên hev, pismamên hev in. Her gav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahiya welatê xwe dixebitin Borî, hal û dawiya wan bi hev re girêdane. Zimanê wan, girêdana wan, her hal û lebatên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûniştin û mirine.

Çi ye ya ku welatîyan bi hev ve girê dide?

59

Lê te bi xwe kîjan rê hîlbijartîye?

Me jî dil heye em jî bidin pey vê qeydê.

FIRATCEWERÎ: Mîna tê zanîn ziman yek ji faktorên miletbûnê

ye. Faktoreke din jî yekîtiya erdê ye. Ji vê re jî welat tê gotin. Nizanim gelo cenabê te dikare welêt çawan tarîf bike?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Welat erdê bav û kalên me ye. Welat ew diyar e ko pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitî ne û li wê mirine.

Xelkê welatekî çiyê hev in?

Xelkê welatekî, welatîyên hev in... Xelkê welatekî brayên hev, pismamên hev in. Her gav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahiya welatê xwe dixebitin Borî, hal û dawiya wan bi hev re girêdane. Zimanê wan, girêdana wan, her hal û lebatên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûniştin û mirine.

Çi ye ya ku welatîyan bi hev ve girê dide?

59

Welatî bi qenciya hev şa dibin, ber xirabîya hev dikevin. Şîn û şahînetî wan yek in. . . Kam û armanca wan yek in.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa dirijînin. Herê dixebitin ko welatê wan mekevit bin destên mîletên din.

Lê hemû welat ne azad in mamoste, hin ji wan di bin destên mîletin din de ne. . . Mîletin hene ko welatê wan, bi awakî, ketiye bin destên neyar

û dijminan. Wek welatê mîletê me. Welatê Kurdistanê.

Gelo van welatan bi xwe bîndestî pejirandine an ew dixwazin ji bin destan derkevin û serbixwe bijîn?

Ev mîletên ha ji bona rizgariya welatê xwe dixebitin.

Ew çawan dixebitin?



Xebata wan ev e: Rûjekê berê biyaniyan ji welatê xwe derî-  
nin û mîna mîletên din biserxwe bibin, Di nav hev de bi  
xweşî, û bi qencî bijîn.

Herkes hej ji welatê xwe, hej ji welatîyên xwe dike. Hejkirina  
welêt di dilê me de hêviyeke mezin û bilind e. Em pê  
xurt, zexim û canfeda ne.

Welatînî û berpirsiyariyên welatîniyê çi ne mamoste?

60

Welatî bi qenciya hev şa dibin, ber xirabîya hev dikevin. Şîn  
û şahînetî wan yek in. . . Kam û armanca wan yek in.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe  
bêperwa dirijînin. Herê dixebitin ko welatê wan mekevit bin  
destên mîletên din.

Lê hemû welat ne azad in mamoste, hin ji wan di bin  
destên mîletên din de ne. . . Mîletên hene ko welatê wan, bi awakî,  
ketiye bin destên neyar

û dijminan. Wek welatê mîletê me. Welatê Kurdistanê.

Gelo van welatan bi xwe bîndestî pejirandine an ew dixwazin  
ji bin destan derkevin û serbixwe bijîn?

Ev mîletên ha ji bona rizgariya welatê xwe dixebitin.

Ew çawan dixebitin?

Xebata wan ev e: Rûjekê berê biyaniyan ji welatê xwe derî-  
nin û mîna mîletên din biserxwe bibin, Di nav hev de bi  
xweşî, û bi qencî bijîn.

Herkes hej ji welatê xwe, hej ji welatîyên xwe dike. Hejkirina  
welêt di dilê me de hêviyeke mezin û bilind e. Em pê  
xurt, zexim û canfeda ne.

Welatînî û berpirsiyariyên welatîniyê çi ne mamoste?

60

Welatînî di hundurê me de agirekî miqedes e. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hezkirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya, deşt, dar û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şêrîntir in.

Baş e, nîsana miletan çi ye? Mirov çawan wan ji hev vediqetîne? Her millet xweyiyê alekê ye. Al nîşana millet û welêt e. Tevayiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye.

Ji bo miletekî al çi ye? Tê çi maneyê?

Al namûs, rûmet û bextê miletan e. Zarowên her milletî ji bona bilindî û biqedirbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin.

Ala her milletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de qesr, seray, xanî û kûçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slavan lê dikin, wê maç dikin, datînin ser serên xwe.

Niha, mamoste, te divê welat azad an jî bindest be, ew xwediye alekê, an jî nîşanekê ye. Gelo cenabê te dikare alên welatên serbixwe û alên welatên bindest ji me re hebekî şirove bike?

Alên milletên biserxwe, di ser kelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de divekin pêşiyê. Lê alên milletên dîl, wek ya milletê me, ji her derê biderkirî, lihevtewandî li

61

Welatînî di hundurê me de agirekî miqedes e. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hezkirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya, deşt, dar û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şêrîntir in.

Baş e, nîsana miletan çi ye? Mirov çawan wan ji hev vediqetîne?

Her mîlet xweyîyê alekê ye. Al nîşana mîlet û welêt e. Tevayîya heyîna mîletan di ala wan de civiyaye.

Ji bo mîletekî al çi ye? Tê çi maneyê?

Al namûs, rûmet û bextê mîletan e. Zarowên her mîletî ji bona bilindî û biqedirbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin.

Ala her mîletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de qesr, seray, xanî û kûçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slavan lê dîkin, wê maç dîkin, datînin ser serên xwe.

Niha, mamoste, te divê welat azad an jî bindest be, ew xwediyê alekê, an jî nîşanekê ye. Gelo cenabê te dikare alên welatên serbixwe û alên welatên bindest ji me re hebekî şirove bike?

Alên mîletên biserxwe, di ser kelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de divekin pêşiyê. Lê alên mîletên dîl, wek ya mîletê me, ji her derê biderkirî, lihevtewandî li

61  
ser dilê zarowên wan de hilandî ne.

Mîletên dîl dixebitin, xwînên xwe dirijînin ko biyaniyan ji welatên xwe biqewirînin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçikînin.

Ala her mîletî bi rengê ye, an jî bi rengên cihê ne, gelo ala kurdan çawa ye, çi reng tê de hene?

Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise.

Gelo ji bo bidestxsitina vê ala spehî divê zarowên Kurdistanê çi bikin?

Divê zarowên Kurdistanê bixebitin û rûjekê berê vê rojê hilî-

nin, ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilind bikin, li wê bibrûskînin, welatê xwe ser avahiya xwe a pêşîn vegerînin û di bin tava wê re biserxwe û bi kamiranî bijîn.

FIRATCEWERÎ: Te got "Zaroyên Kurdistanê". Em çi ne, navê welatê me çi ye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Kurd em in, Kurdistan welatê 62

ser dilê zarowên wan de hilandî ne.

Miletên dîl dixebitin, xwînên xwe dirijînin ko biyaniyan ji welatên xwe biqewirînin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçikînin.

Ala her milletî bi renekî ye, an jî bi rengên cihê ne, gelo ala kurdan çawa ye, çi reng tê de hene?

Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise.

Gelo ji bo bidestxsitina vê ala spehî divê zarowên Kurdistanê çi bikin?

Divê zarowên Kurdistanê bixebitin û rûjekê berê vê rojê hilînin, ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilind bikin, li wê bibrûskînin, welatê xwe ser avahiya xwe a pêşîn vegerînin û di bin tava wê re biserxwe û bi kamiranî bijîn.

FIRATCEWERÎ: Te got "Zaroyên Kurdistanê". Em çi ne, navê welatê me çi ye?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Kurd em in, Kurdistan welatê 62

me ye.

Tu dizanî ku gelek ji Welatîyên me nezan bûn, xwe û welatê xwe bas nas nedikirin, loma gelek biyanî hatin welatê

me, li welatê me geriyan, li ser welatê me kitêb nivî-  
sandin. Ma em dikarin digel vê jî bibêjin ku em ji biyaniyan  
bêtir û çêtir welatê xwe nas dikin?

Bivê nevē em xwe û welatê xwe ji herkesî, ji biyaniyan bêtir  
û çêtir nas dikin.

Tu dikarî mînakekê bidî?

Di nav me de mirovên welê hene, dikarin zer û zinarên çiya  
û serjorek û serjêrekên bilincihên welatê xwe ji ber bijmêrin.  
Ma bi rastî jî ev têra naskirina welatekî dike?

Digel vê hindê hin tiştên welatê me hene ko em xwe bi xwe  
nikarin wan bibînin, hêj bêtir nikarin wan ji hev derêxînin,  
û li ser vebin.

Tu dixwazî bibêjî ku weiat jî wek malekê ye, wek nava  
malê ye; endamên malê kêmaniyên hundurîn zêde nabî-  
nin. . . Her kes hundurê mala xwe ji xelkê çêtir nas dike. Lê biyanî  
wekê dikevin nav maleke ji xweyiyî bêtir qencî û kêmaniyên  
63

me ye.

Tu dizanî ku gelek ji Welatîyên me nezan bûn, xwe û welatê  
xwe bas nas nedikirin, loma gelek biyanî hatin welatê  
me, li welatê me geriyan, li ser welatê me kitêb nivî-  
sandin. Ma em dikarin digel vê jî bibêjin ku em ji biyaniyan  
bêtir û çêtir welatê xwe nas dikin?

Bivê nevē em xwe û welatê xwe ji herkesî, ji biyaniyan bêtir  
û çêtir nas dikin.

Tu dikarî mînakekê bidî?

Di nav me de mirovên welê hene, dikarin zer û zinarên çiya  
û serjorek û serjêrekên bilincihên welatê xwe ji ber bijmêrin.

Ma bi rastî jî ev têra naskirina welatekî dike?

Digel vê hindê hin tiştên welatê me hene ko em xwe bi xwe nikarin wan bibînin, hêj bêtir nikarin wan ji hev derêxînin, û li ser vebin.

Tu dixwazî bibêjî ku weiat jî wek malekê ye, wek nava malê ye; endamên malê kêmaniyên hundurîn zêde nabînin. . . Her kes hundurê mala xwe ji xelkê çêtir nas dike. Lê biyanî wekê dikevin nav maleke ji xweyiyî bêtir qencî û kêmaniyên

63

wê dibînin.

Ma biyanîyên welê hene ku bi rastî welatê me, ne ji me bêtir be jî, bi qasî me nas dikin?

Gelek mebin jî hin biyanî hene ko hatine, ketine nav welatê me, lê temaşe kirine, kê m û zêde hînî zimanê me bûne, û di heqê me de kitêbin nivîsandine.

Kitêbên welê bi kîjan zimanî hene?

Kitêbên welê di her zimanê ewrûpayî de hene, rûsî, elmanî, frensizî, ingilîzî, talyanî h. p. . . Digel ku me navên hinan ji wan bihîstiyê jî, lê ew wernegeriyane

zimanê me. Loma haya piraniya kurdan ji wan

tuneye. Gelo cenabê te ku bi evqas ziman dizane, nafikire ku hinan ji van kitêban wergerîne kurdmanciyê?

Min dil heye ji wan kitêban birinen bikêr wergerînim kurdmanciyê.

. . Gelo van biyanîyan di lehê me de an jî di eleyhê me de nivîsandine?

Heye ko ew biyanîyên ha carinan di eleyhê me de jî got û

nivîsandi bin. Ji xwe piraniya wan di lehê me de gotine û

me yldariya me kirine. Herçî jî bit her du texlît nivîsar bi kêrî

64

wê dibînin.

Ma biyaniyên welê hene ku bi rastî welatê me, ne ji me bêtir be jî, bi qasî me nas dikin?

Gelek mebin jî hin biyanî hene ko hatine, ketine nav welatê me, lê temaşe kirine, kêm û zêde hînî zimanê me bûne, û di heqê me de kitêbin nivîsandine.

Kitêbên welê bi kîjan zimanî hene?

Kitêbên welê di her zimanê ewrûpayî de hene, rûsî, elmanî, frensizî, inglîzî, talyanî h. p. . . Digel ku me navên hinan ji wan bihîstiyê jî, lê ew wernegeriyane

zimanê me. Loma haya piraniya kurdan ji wan

tuneye. Gelo cenabê te ku bi evqas ziman dizane, nafikire ku hinan ji van kitêban wergerîne kurdmanciyê?

Min dil heye ji wan kitêban birinen bikêr wergerînim kurdmanciyê.

. . . Gelo van biyaniyan di lehê me de an jî di eleyhê me de nivîsandine?

Heye ko ew biyaniyên ha carinan di eleyhê me de jî got û nivîsandi bin. Ji xwe piraniya wan di lehê me de gotine û meydariya me kirine. Herçî jî bit her du texlît nivîsar bi kêrî

64

me ten.

Mamoste, te got ku tu ê van nivîsaran wergerînî kurdmanciyê.

Gelo tu ê wan bi kîjan riyê wergerînî? Tu ê li

gorî rêzê û tarîxê biçî an. . . Di wergerandinê de bi rêz û tarîxê ve naçim. Herçî ko dikevin

destê min û bi kêrî me tên ezê wan wergerînim kurdmanciyê

û hêdî hêdî belav bikim.

Ezê wan bi awakî welê wergerînim ko mana rind bête seh kirin û qise herçend heye. ewçend kurdandî bibit, ne ko pirsan yeko yeko wergerînim kurdmanciyê û tiştêkî welê bînim pê ko pirs kurdmancî lê awa biyanî bibit.

Ev bi rastî xebateke hêja ye, em di vî warî de te pîroz dikin. Niha jî hin xebatên weha têne kirin lê kê in. Wekî din wê bas be ger nivsê îro bi xebatên do bihesin, dibe ku xebatên nîvcomayî ew bibin serî. Ji van nivîskarên biyanî tu nav tê bîra cenabê te?

Marten Hartman.

Marten Harfman kî ye, ji kîjan nijadî ye, çi nivîsandiye? Harman zanayekî elman e. Di nav Kurdistanê de geriyaye, hînî zimanê me bûye. Kitêbeke wî heye, "Botan" kitêbeke hêja û kûr. Herwekî ji wê kitêbê xuya dibe Hartman li her tiştê welatê me hûr mêze kiriye. Min ew kitêb li Germenya-65

me ten.

Mamoste, te got ku tu ê van nivîsaran wergerîni kurdmanciyê. Gelo tu ê wan bi kîjan riyê wergerîni? Tu ê li gorî rêzê û tarîxê biçî an. . . Di wergerandinê de bi rêz û tarîxê ve naçim. Herçî ko dikevin destê min û bi kêrî me tên ezê wan wergerînim kurdmanciyê û hêdî hêdî belav bikim.

Ezê wan bi awakî welê wergerînim ko mana rind bête seh kirin û qise herçend heye. ewçend kurdandî bibit, ne ko pirsan yeko yeko wergerînim kurdmanciyê û tiştêkî welê bînim pê ko pirs kurdmancî lê awa biyanî bibit.

Ev bi rastî xebateke hêja ye, em di vî warî de te pîroz dikin.



Niha jî hin xebatên weha têne kirin lê kê m in. Wekî din wê bas be ger nivsê îro bi xebatên do bihesin, dibe ku xebatên nivcomayî ew bibin serî. Ji van nivîskarên biyanî tu nav tê bîra cenabê te?

Marten Hartman.

Marten Harfman kî ye, ji kîjan nijadî ye, çî nivîsandîye?

Harman zanayekî elman e. Di nav Kurdistanê de geriyaye, hînî zimanê me bûye. Kitêbeke wî heye, "Botan" kitêbeke hêja û kûr. Herwekî ji wê kitêbê xuya dibe Hartman li her tiştê welatê me hûr mêze kiriye. Min ew kitêb li Germenya-65

yê dît û xwendî bû.

Te got ku hinek ji van biyaniyan hînî kurdî jî bûbûn.

Gelo Mîrza Hartman ku kitêbek bi navê "Botan" nivîsandîye û li Kurdistanê geriyaye, hewl nedaye ku hin çîrokên kurdî jî wergerîne zimanê ewrûpayî û bi vê yekê kurdan bi wan bide naskirin?

Li gora bihîstina min Hartman Memozîna Xanî werdigerand elmaniyê, lê emrê wî têr nekir. Paş ko çend rûpelên wê wergerandi bûn çû rehetê.

Bi hêviya ku wê lêkolînerên me kitêba Hartman "Botan" bi dest bixin û bigihînin nivşê me, bi destûra te be ez dixwazim em derbasî mijareke din bibin.

FIRAT CEWERÎ: Tirk dibêjin ku dîroka Kurdistanê tune ye, eslê kurdan ji esîreke tirkan tê. Ma bi rastî Kurdistan bê dîrok e?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Dîroka Kurdistanê dîrokeke kevin e. Kurdistan rewşa Polonyayê ya kevin tîne bîra mirov.

Polonya jî di nava çend dewletan de hatibû parvekirin. Dî-  
66

yê dît û xwendi bû.

Te got ku hinek ji van biyaniyan hînê kurdî jî bûbûn.

Gelo Mîrza Hartman ku kitêbek bi navê "Botan" nivî-  
sandiye û li Kurdistanê geriyaye, hewl nedaye ku hin çî-  
rokên kurdî jî wergerîne zimanê ewrûpayî û bi vê yekê  
kurdan bi wan bide naskirin?

Li gora bihîstina min Hartman Memozîna Xanî werdigerand  
elmaniyê, lê emrê wî têr nekir. Paş ko çend rûpelên wê  
wergerandi bûn çû rehetê.

Bi hêviya ku wê lêkolînerên me kitêba Hartman "Botan"  
bi dest bixin û bigihînin nivşê me, bi destûra te be ez  
dixwazim em derbasî mijareke din bibin.

FIRAT CEWERÎ: Tirk dibêjin ku dîroka Kurdistanê tune ye,  
eslê kurdan ji esîreke tirkan tê. Ma bi rastî Kurdistan bê  
dîrok e?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Dîroka Kurdistanê dîrokeke  
kevin e. Kurdistan rewşa Polonyayê ya kevin tîne bîra mirov.  
Polonya jî di nava çend dewletan de hatibû parvekirin. Dî-  
66

rokeke xuyayî, cografyayeke xuyayî ya welatê min Kurdistan  
û milletên min kurdan heye. Ne hewce ye ko em zêde dûr  
herin û herin dema Medan. Em dikarin Ksenefon û "Vegera  
Dehhezaran" bi bîr bînin bes e.

Hinek ji tirkan û herweha hinek ji qaso entelektuelên  
tirkan dibêjin ku li Tirkiyeyê pîrsgirêka kurdî di van salên  
dawiyê de dest pê kiriye. Ew vê yekê ji pîrsgirêkeke

kurdan wêdetir, pirsgirêkeke aborî dibînin. Ma bi rastî jî welê ye? Gelo di dema Osmaniyan de jî pirsgirêkeke welê tune bû?

Pirsgirêka kurdan li Tirkiyeyê, ji dema ko karbidestên kurdan bi riya îdrîsê Bedlîsî, hukumdariya Siltan Selîm qebûl kirine û bi vir de heye.

Yanî tu dibêjî ku di dema Osmaniyan de pirsgirêka kurd hebû û li ser dihate peyivandin. Ger mirov arsîvên Osmaniyan tev bide, mirov ê pêrgî belgeyên li ser dîrok û pirsgirêka kurdan neyê?

Gava mirov dîroka Osmaniyan tev bide, di bin nav û nîşanên cihê de be jî, mirov ê pêrgî pirsgirêka kurdî were.

Ev tê wê maneyê ku dîroka kurdan dîrokeke kevin e û bi vê ve girêdayî, pirsgirêka kurdan jî pirsgirêkeke kevin e. Belê, pirsgirêk ji pir kevin de heye. Lê belê, li gora dem û 67

rokeke xuyayî, cografyayeke xuyayî ya welatê min Kurdistan û milletên min kurdan heye. Ne hewce ye ko em zêde dûr herin û herin dema Medan. Em dikarin Ksenefon û "Vegera Dehhezaran" bi bîr bînin bes e.

Hinek ji tirkan û herweha hinek ji qaso entelektuelên tirkan dibêjin ku li Tirkiyeyê pirsgirêka kurdî di van salên dawiyê de dest pê kiriye. Ew vê yekê ji pirsgirêkeke kurdan wêdetir, pirsgirêkeke aborî dibînin. Ma bi rastî jî welê ye? Gelo di dema Osmaniyan de jî pirsgirêkeke welê tune bû?

Pirsgirêka kurdan li Tirkiyeyê, ji dema ko karbidestên kurdan bi riya îdrîsê Bedlîsî, hukumdariya Siltan Selîm qebûl

kirine û bi vir de heye.

Yanî tu dibêjî ku di dema Osmaniyan de pirsgerêka kurd hebû û li ser dihate peyvandin. Ger mirov arsîvên Osmaniyan tev bide, mirov ê pêrgî belgeyên li ser dîrok û pirsgerêka kurdan neyê?

Gava mirov dîroka Osmaniyan tev bide, di bin nav û nîşanên cihê de be jî, mirov ê pêrgî pirsgerêka kurdî were.

Ev tê wê maneyê ku dîroka kurdan dîrokeke kevin e û bi vê ve girêdayî, pirsgerêka kurdan jî pirsgerêkeke kevin e.

Belê, pirsgerêk ji pir kevin de heye. Lê belê, li gora dem û

67  
dewranan hatiye guhertin û şikil stendiye.

Bi çi awayî mamoste?

Wan carinan gotine ko ev pirsgerêkeke feodalîzmê ye. Carinan bi çavên mezhebî lê hatiye nihêrîn. Carinan jî gava kurdan serî hildane, bi navê eşîrên xerab hatine navandin.

Divê em jî mikur werin ku di hin serîhildanên kurdan de karakterên milî kêm bûn. Lê ez bawer dikim mirov îro nikare vê yekê bibêje. . . Herçî şiklê îro ye, di vê sedsalê de karakterîstîka neteweyî ya herî xuyayî ye.

Mîna cenabê te jî pê dizane, piştî Mesrûtiyetê, ji bo gurkirina neteweperestiya tirk "Tiirk Ocaklari" vebûn. Min carekê ji te bihîstibû ku fikrên neteweperestî an jî milletpereweriya kurdî, berî ya tirkan e. . . Belê, berî ya tirkan e. Berî bi sedsalan Ehmedê Xanî behsa

netewetiyê kurd kiriye. Ehmedê Xanî ko mijara berhema xwe ji destaneke gelerî stendiye, ji serî heta binî bi sembolan

behsa milletê kurd û Kurdistanê dike. Ehmedê Xanî yê ko milletê kurd temsîl dike diavêje zîndanê, lê dixwaze millet li riyên xelaskirina wî bigerin.

Wê çaxê mîna ku hin tirk dibêjin, pirsgirêka kurdî ne îro dest pê kiriye, ev pirsgirêkeke kevin e. . . 68  
dewranan hatiye guhertin û şikil stendiye.

Bi çi awayî mamoste?

Wan carinan gotine ko ev pirsgirêkeke feodalîzmê ye. Carinan bi çavên mezhebî lê hatiye nihêrîn. Carinan jî gava kurdan serî hildane, bi navê eşîrên xerab hatine navandin.

Divê em jî mikur werin ku di hin serîhildanên kurdan de karakterên milî kêm bûn. Lê ez bawer dikim mirov îro nikare vê yekê bibêje. . . Herçî şiklê îro ye, di vê sedsalê de karakterîstîka neteweyî ya herî xuyayî ye.

Mîna cenabê te jî pê dizane, piştî Mesrûtiyetê, ji bo gurkirina neteweperestiya tirk "Tiirk Ocaklari" vebûn. Min carekê ji te bihîstibû ku fikrên neteweperestî an jî milletpereweriya kurdî, berî ya tirkan e. . . Belê, berî ya tirkan e. Berî bi sedsalan Ehmedê Xanî behsa

netewetiyê kurd kiriye. Ehmedê Xanî ko mijara berhema xwe ji destaneke gelerî stendiye, ji serî heta binî bi sembolan behsa milletê kurd û Kurdistanê dike. Ehmedê Xanî yê ko milletê kurd temsîl dike diavêje zîndanê, lê dixwaze millet li riyên xelaskirina wî bigerin.

Wê çaxê mîna ku hin tirk dibêjin, pirsgirêka kurdî ne îro dest pê kiriye, ev pirsgirêkeke kevin e. . . 68

Fikra kurdî û hişyarbûna fikra milî li ba kurdan ne pirsgirê-

kek îro û ne jî ya do ye. Ev fikra ha berî niha bi 250 sal berê dest pê bûye û serî hildaye.

Ez bawer dikim di derheqa tirkîtiyê de bîranîneke te ya dibistanê hebû. Tu dikarî ji kerema xwe re ji me re behsa wê bîranînê bikî?

Bi qasî ko di bîra min de maye, hê salvegera duwemîn ya dehê tîrmehê nehatibû bibîranîn. Rojekê mamosteyê me yê edebiyatê ji me re got ku wê li avahiya tiyatroyê ya li Şehzadebaşiyê

konferanseke girîng were dayîn. Ez û çend hevalên ku em meraqdarê van tiştan bûn bi hev re çûne konferansê.

Du peya derketin ser sehneyê. Yek jê Yusuf Akçora beg bû.

Wî hevalî xwe bi me da naskirin. Dîsan ger ez ne şaş bim navê vî zatî îsmail Gansperenskî bû. Gansperenskî efendî bi tirkîyeke ku pir bi zehmetî ji aliyê stenboliyan ve dihate fêhmkirin, konferanseke dirêj da. Wî bêî navbir behsa tirkan û netirkan dikir. Piştî ko konferans xelas bû, tiştê ko min û hevalên xwe fêhm kirin ev bû: her kes tirk in, li Tirkîyeyê ji bilî tirkan tu milletên din nînin û divê tunebin jî.

Ew dema ku cenabê te behs dike, li Stenbolê ji tirkan bê-tir ji gel û neteweyên din hebûn. Gelo kesî ji konferansa Gansperenskî re tu reaksiyon nîşan neda?

Wê rojê di nav me de yek xwendevanê tirk jî tunebû. Ji bilî min, kurdekî din jî, çerkezek, arnawidek, gurciyek û yewna-69

Fikra kurdî û hişyarbûna fikra milî li ba kurdan ne pirsgirêkek îro û ne jî ya do ye. Ev fikra ha berî niha bi 250 sal berê dest pê bûye û serî hildaye.

Ez bawer dikim di derheqa tirkîtiyê de bîranîneke te ya dibistanê hebû. Tu dikarî ji kerema xwe re ji me re behsa wê bîranînê bikî?

Bi qasî ko di bîra min de maye, hê salvegera duwemîn ya dehê tîrmehê nehatibû bibîranîn. Rojekê mamosteyê me yê edebiyatê ji me re got ku wê li avahiya tiyatroyê ya li Şehzadebaşiyê

konferanseke girîng were dayîn. Ez û çend hevalên ku em meraqdarê van tiştan bûn bi hev re çûne konferansê. Du peya derketin ser sehneyê. Yek jê Yusuf Akçora beg bû. Wî hevalî xwe bi me da naskirin. Dîsan ger ez ne şaş bim navê vî zatî îsmâil Gansperenskî bû. Gansperenskî efendî bi tirkîyeke ku pir bi zehmetî ji aliyê stenboliyan ve dihate fêhmkirin, konferanseke dirêj da. Wî bêî navbir behsa tirkan û netirkan dikir. Piştî ko konferans xelas bû, tiştê ko min û hevalên xwe fêhm kirin ev bû: her kes tirk in, li Tirkîyeyê ji bilî tirkan tu milletên din nînin û divê tunebin jî.

Ew dema ku cenabê te behs dike, li Stenbolê ji tirkan bê-tir ji gel û neteweyên din hebûn. Gelo kesî ji konferansa Gansperenskî re tu reaksiyon nîşan neda?

Wê rojê di nav me de yek xwendevanê tirk jî tunebû. Ji bilî min, kurdekî din jî, çerkezek, arnawidek, gurciyek û yewna-

69  
niyek hebû. Rojekê piştî wê, gava em hemû heval li dibistanê civiyan û me li ser konferansa Gansperenskî efendî sohbet kir, kesî ji me ev nêrîna Gansperenskî qebûl nedikir. Ev nêrîna ha bi me pir çewt û ne di cih de hatibû û ltiribû ko manewiyeta

me isyan bike.

Ez dizanim ku tu li dijî neheqîyan û li dijî nêrînên ne ilmî bêdeng namînî. Ji xwe gava ku nijadê te tê înkarkirin, hebûna te tune tê hesibandin tu isyan dikî. Bas e, reaksiyona te bi xwe li dijî vê nêrîna ha çi bû?

Me di wê dîrokê de li dibistanê rojnameyeke ko dihate hezkirin derdixist. Ez sernivîskarê rojnameyê bûm. Reaksiyona ko Gansperenskî li ba min peyda kiribû, kir ko ez di rojnameyê de li ser kurd û Kurdistanê bendekê binivîştînim.

Te di benda xwe de behsa çi kir?

Min behsa dîroka kurdan, nijadê kurdan, welatê wan û behsa taybetmendiyên kurdan kir.

Gelo armanca wan bi wan celebkonferansan çi bû?

Wan bi konferansên welê û bi çapemeniyê dixwestin ko li dijî gel û neteweyên çihê, bingehê miliyeta tirk biavêjin.

Ev rişteki ecêb e mamoste. Mîna cenabê te jî pê dizane, mirov nikare nijadêkî nû ji nijadên cida biafirîne. Mirov 7i

niyek hebû. Rojekê piştî wê, gava em hemû heval li dibistanê civîyan û me li ser konferansa Gansperenskî efendî sohbet kir, kesî ji me ev nêrîna Gansperenskî qebûl nedikir. Ev nêrîna ha bi me pir çewt û ne di cih de hatibû û Itiribû ko manewiyeta

me isyan bike.

Ez dizanim ku tu li dijî neheqîyan û li dijî nêrînên ne ilmî bêdeng namînî. Ji xwe gava ku nijadê te tê înkarkirin, hebûna te tune tê hesibandin tu isyan dikî. Bas e, reaksiyona te bi xwe li dijî vê nêrîna ha çi bû?



Me di wê dîrokê de li dibistanê rojnameyeke ko dihate hezkirin derdixist. Ez sernivîskarê rojnameyê bûm. Reaksiyona ko Gansperenskî li ba min peyda kiribû, kir ko ez di rojnameyê de li ser kurd û Kurdistanê bendekê binivîştînim.

Te di benda xwe de behsa çî kir?

Min behsa dîroka kurdan, nijadê kurdan, welatê wan û behsa taybetmendiyên kurdan kir.

Gelo armanca wan bi wan celebkonferansan çî bû?

Wan bi konferansên welê û bi çapemeniyê dixwestin ko li dijî gel û neteweyên çihê, bingehê miliyeta tirk biavêjin.

Ev rişteki ecêb e mamoste. Mîna cenabê te jî pê dizane, mirov nikare nijadekî nû ji nijadên cida biafirîne. Mirov

7i

nikare nijadên din inkar bike, xwe ji wan nijadan bihesibîne û ji nijadên têvel nijadekî nikenû bîne pê.

Zelaliya nijadan û ruhê parastina nijadan, fikir û hîseke biesil û rêzdar e. Ev hîsên ha ne bi tenê li ba insanan, lê li ba heywanan jî hene. Mîna tu jî dizanî, hespên biesil nêzîkî hespên bêesil nabin. Malbat di zewacê de li esil digerin. Tiştên ko alman dikin, ew e ko ew nijadê xwe yê arî biparêzin û nehêlin ko xwîna derve tevî xwîna wan bibe.

Lê tirk çawan dikin mamoste?

Tirk dixwazin xwîna millet û nijadên din bi zorê tevî xwîna xwe bikin.

Gelo ev li hemberî nijadê tirkan bi xwe ne bêhurmetiyek e?

Ev li hemberî milletê tirk heqareteke mezin e.

Gava mirov li Tirkiyeya îro dinêre, mirov dibîne ku tirk

di warê asîmîlekirina hin gel û neteweyan de bi ser ketine. Herçî milletên ne musulman bûn, ji aliyê tirkên musulman ve hatin kuştin û bi wê riyê ji ortê rabûn. Lê ji ber ku dînê kurdan û tirkan yek bû, tirkan nikarîbûn bi kustinê kurdan ji ortê rabikin, di şûna wê de gotin, ku em birayên hev in, em musulman in û em herdu millet xwediyê Tirkiyeyê ne. Lê belê dîsan jî bi tenê bi navê tir-

72

nikare nijadên din inkar bike, xwe ji wan nijadan bihesibîne û ji nijadên têvel nijadekî nikenû bîne pê.

Zelaliya nijadan û ruhê parastina nijadan, fikir û hîseke biesil û rêzdar e. Ev hîsên ha ne bi tenê li ba insanan, lê li ba heywanan jî hene. Mîna tu jî dizanî, hespên biesil nêzîkî hespên bêesil nabin. Malbat di zewacê de li esil digerin. Tiştên ko alman dikin, ew e ko ew nijadê xwe yê arî biparêzin û nehêlin ko xwîna derve tevî xwîna wan bibe.

Lê tirk çawan dikin mamoste?

Tirk dixwazin xwîna millet û nijadên din bi zorê tevî xwîna xwe bikin.

Gelo ev li hemberî nijadê tirkan bi xwe ne bêhurmetiyek e?

Ev li hemberî milletê tirk heqareteke mezin e.

Gava mirov li Tirkiyeya îro dinêre, mirov dibîne ku tirk di warê asîmîlekirina hin gel û neteweyan de bi ser ketine. Herçî milletên ne musulman bûn, ji aliyê tirkên musulman ve hatin kuştin û bi wê riyê ji ortê rabûn. Lê ji ber ku dînê kurdan û tirkan yek bû, tirkan nikarîbûn bi kustinê kurdan ji ortê rabikin, di şûna wê de gotin, ku

em birayên hev in, em musulman in û em herdu milet  
xwediyê Tirkiyeyê ne. Lê belê dîsan jî bi tenê bi navê tir-  
72

kîtiyê... Nizanim gelo haya te ji plan û projeyên wan  
yên di derheqa kurdan de heye?

Li gora plana wan, wê kurd nehatina kuştin, lê wan ê cihê  
xwe di nava miletên temsîlkar de bigirtana. Lê dîsan jî diviyabû  
kurd tavi lê bihatina asîmîlekirin û bibûna tirk. Ji bo  
temsîlkirina kurdan qanûnek jî derxistin. Ev qanûna ha ji  
aliyê Siltanê bedbext Siltan Reşîd ve hate tesdîqkirin.  
Ez bawer dikim ji vê qanûnê re qanûna "Vîlayetî Şarkiye"  
digotin. Baş e, armanca wan ya bingehîn bi vê qanû-  
nê çi bû?

Armança wan bi vê qanûnê ew bû ko xelkê Kurdistanê ji cih  
û warên wan rabikin û wan li nava tir.kan, li gundên tirkan  
bi cih bjkin; têkiliyên xelkê bi carekê ve ji şêx, axa û begên  
kurdan bibirin, da ko kurd zû asîmîle bibin û bibin tirk.

Baş e, em bibêjin wan kurd ji Kurdistanê rakirin û asmî-  
le kirin, ma wan ê çi bikirina ji Kurdistaneke vala?

Wan ê Kurdistan vala nehiştana, wan ê di şûna kurdan de  
tirk bi cih bikirana, Bi vê riyê, piştî nivşekî du nifşan wê  
kurd êdî bibûna titk,

Gelo di destên te de tu delîlên ku hejmara kurdên  
koçber nîşan dide heye?

73

kîtiyê... Nizanim gelo haya te ji plan û projeyên wan  
yên di derheqa kurdan de heye?

Li gora plana wan, wê kurd nehatina kuştin, lê wan ê cihê

xwe di nava milletên temsîlkar de bigirtana. Lê dîsan jî diviyabû  
kurd tavilê bihatina asîmîlekirin û bibûna tirk. Ji bo  
temsîlkirina kurdan qanûnek )î derxistin. Ev qanûna ha ji  
aliyê Siltanê bedbext Siltan Reşîd ve hate tesdîqkirin.  
Ez bawer dikim ji vê qanûnê re qanûna "Vîlayetî Şarkiye"  
digotin. Baş e, armanca wan ya bingehîn bi vê qanû-  
nê çi bû?

Armança wan bi vê qanûnê ew bû ko xelkê Kurdistanê ji cih  
û warên wan rabikin û wan li nava tir.kan, li gundên tirkan  
bi cih bjkin; t êkiliyên xelkê bi carekê ve ji şêx, axa û begên  
kurdan bibirin, da ko kurd zû asîmîle bibin û bibin tirk.  
Baş e, em bibêjin wan kurd ji Kurdistanê rakirin û asmî-  
le kirin, ma wan ê çi bikirina ji Kurdistaneke vala?  
Wan ê Kurdistan vala nehiştana, wan ê di şûna kurdan de  
tirk bi cih bikirana, Bi vê riyê, piştî nivşekî du nifşan wê  
kurd êdî bibûna titk,  
Gelo di destên te de tu delîlên ku hejmara kurdên  
koçber nîşan dide heye?

73

Piştî ko ez vegeyriyam Stenbolê û min bi alîkariya arşîva muduriyeta  
mahciran, li ser koçberên Kurdistanê lêkolînek kir,  
hejmareke bi qasî 650.000Î derket holê. Gava ez diçûm cepheyê,  
ez li Torosê pêrgî van koçberên kurd hatibûm. Gava ez  
nêzîkî van insanan bûm, min dît ku piraniya wan ji sermayê  
qefilî ne û bûne mîna hêkelên ji bûzê. Ev mirovên ko ji welatê  
xwe hatibûn derxistin, di riyên de ji serma, birçîna û  
nexweşiyên mehû bûbûn.

Mamoste, te got, ku gava ez diçûm cepheyê. Ma qey tu jî

wê demê di artêsê de bû yî?

Ez di wê dîrokê de bi artêşa Nûrî paşa re li Bakuyê bûm. Ez li wê derê sûbayê qarargehê bûm. Min wê demê ji sûbayên ku di Ocaxên Tirkan de perwerde bûbûn de, ev gotinên han bihîstibûn: "Gava em hatin me ZO qir kirin, em ê di vegeerê de jî LOyan qir bikin."

ZO û LO çi ne mamoste, ma ew tîn çi maneyê?

Ji ZO qesta wan ermenî bûn, ji LO jî qesta wan kurd bûn.

Gelo ew insanên ku ji welêt hatibûn surgunkirin, her U nava tirkan man, an dîsan vegeeriyên welêt?

Gava ez di sala igîan de derketibûm gera Kurdistanê, ez li Helebê pêrgî qefilek ji van koçberan hatim. Ew vedigeriyên welêt. Li gora agahdariyên ko min ji wan stendin, gava ew

74

Piştî ko ez vegeeriyam Stenbolê û min bi alîkariya arşîva muduriyeta mahciran, li ser koçberên Kurdistanê lêkolînek kir, hejmareke bi qasî 650.000ê derket holê. Gava ez diçûm cepheyê, ez li Torosê pêrgî van koçberên kurd hatibûm. Gava ez nêzîkî van insanan bûm, min dît ku piraniya wan ji sermayê qefilî ne û bûne mîna hêkelên ji bûzê. Ev mirovên ko ji welatê xwe hatibûn derxistin, di rîyan de ji serma, birçîna û nexweşiyên mehû bûbûn.

Mamoste, te got, ku gava ez diçûm cepheyê. Ma qey tu jî wê demê di artêsê de bû yî?

Ez di wê dîrokê de bi artêşa Nûrî paşa re li Bakuyê bûm. Ez li wê derê sûbayê qarargehê bûm. Min wê demê ji sûbayên ku di Ocaxên Tirkan de perwerde bûbûn de, ev gotinên han bihîstibûn: "Gava em hatin me ZO qir kirin, em ê di vegeerê

de jî LOyan qir bikin."

ZO û LO çi ne mamoste, ma ew tîn çi maneyê?

Ji ZO qesta wan ermenî bûn, ji LO jî qesta wan kurd bûn.

Gelo ew insanên ku ji welêt hatibûn surgunkirin, her U nava tirkan man, an dîsan vegeriyan welêt?

Gava ez di sala igi<sup>an</sup> de derketibûm gera Kurdistanê, ez li Helebê pêrgî qefilek ji van koçberan hatim. Ew vedigeriyan welêt. Li gora agahdariyên ko min ji wan stendin, gava ew 74

hatibûn surgunkirin hejmara wan 485 kes bûn, niha bi tenê 255 kes ji wan mabûn.

Gelo hukûmeta Ittihat û Terakkî bi van qanûn û kirinên xwe bi ser ket? Kurd ji kurdîtiyê bi dûr xistin? Dawî li pirsgerêka kurdî anîn?

Hukûmeta ittihat û Terakkî bêê ku di planên xwe de bi ser bikeve, çû. Digel hemû surgun û qetlîaman dîsan jî zora wijdan û neteweperestiya kurdan nebirin. Tam berevajiyê wê, ev darbeya ko di şerê alemîn de li kurdan hate xistin, hîsên kurdan yê neteweyî, hişyariya milî hê xurtir û gurtir kir. Vê yeka han kir ko kurd kurd bimînin û mîna kurdan bijîn.

Xwesteka kurdmayîne êdî bi awayekî hê xurtir hate zimên.

Niha mamoste, em zêde dûr neçin, ji avakirina cumhuriyeta Tirkiyeyê û bi vir de îdeolojiya fermî kurd tune hesabandine,

kurd înkâr kirine û her tim gotine ku pirsgerêka

kurdî tune ye. Yanî wan tu carî rastî û hebûna kurdan

bi awayekî fermî qebûl nekirine. Gelo bi rastî ew ê

bikaribin pirsgerêka kurdî tune bikin? Ew ê bikaribin di

vê polîtîkaya xwe de bi ser bikevin?

Pirsgirêka kurdî ne pirsgirêkek nû ye, ew ne do û ne jî çend sal berê derketiye holê. Ev pirsgirêkeke welê ye ko qet nehatiye çareserkirin û bi sedsalan hebûna xwe dewam kiriye.

Gava mirov rewşa cografî ya Kurdistanê dide ber çavan, mirov dibîne ko pirsgirêka Kurdistanê piştî şerê cîhanê ê yeke-  
75

hatibûn surgunkirin hejmara wan 485 kes bûn, niha bi tenê 255 kes ji wan mabûn.

Gelo hukûmeta Ittihat û Terakkî bi van qanûn û kirinên xwe bi ser ket? Kurd ji kurdîtiyê bi dûr xistin? Dawî li pirsgirêka kurdî anîn?

Hukûmeta îttihat û Terakkî bêî ku di planên xwe de bi ser bikeve, çû. Digel hemû surgun û qetlîaman dîsan jî zora wijdan û neteweperestiya kurdan nebirin. Tam berevajiyê wê, ev darbeya ko di şerê alemîn de li kurdan hate xistin, hîsên kurdan yê neteweyî, hişyariya milî hê xurtir û gurtir kir. Vê yeka han kir ko kurd kurd bimînin û mîna kurdan bijîn.

Xwesteka kurdmayînê êdî bi awayekî hê xurtir hate zimên.

Niha mamoste, em zêde dûr neçin, ji avakirina cumhuriyeta Tirkiyeyê û bi vir de îdeolojiya fermî kurd tune hesabandine, kurd înkâr kirine û her tim gotine ku pirsgirêka

kurdî tune ye. Yanî wan tu carî rastî û hebûna kurdan bi awayekî fermî qebûl nekirine. Gelo bi rastî ew ê bikaribin pirsgirêka kurdî tune bikin? Ew ê bikaribin di vê polîtîkaya xwe de bi ser bikevin?

Pirsgirêka kurdî ne pirsgirêkek nû ye, ew ne do û ne jî çend sal berê derketiye holê. Ev pirsgirêkeke welê ye ko qet nehatiye çareserkirin û bi sedsalan hebûna xwe dewam kiriye.

Gava mirov rewşa cografî ya Kurdistanê dide ber çavan, mirov dibîne ko pirsgirêka Kurdistanê piştî şerê cîhanê ê yeke-

75

mîn navneteweyî bûye.

Lê heta ko li vê gerestêra me kurdên ko hatine kolekirin hebin, wê pirsgirêka kurdan jî her û her hebe.

FIRAT CEWERÎ: Ez bawer dikim yek ji sebebên girîng û bingehîn yê bindestmayîna kurdan ew e ku kurd nebûne yek û nabin yek.

Ez dixwazûn pirsaxwe welê formule bikim; gelo tu xurtî an jî qelsiya civatekê bi çi ve girê didî?

Tifaq û yekbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifaq û berberî qelsî û jariya civatê ye.

Di vê cîhanê de mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayina hev ber barên hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan hatine pê.

MiJet û dewletan bi tifaqê gihane bilindiya her tiştî û bi nifaqê ketine biniya kortala nayînê. Ji lewre mirov dikare bibêje heyîn di tifaqê de, neyîn di nifaqê de ye.

Xurtî û zexmiya yekbûnê di lehiyê de gelek qenc têt dîtin.

Çawan?

Lehî ji hevgihana dilopên baranê pê ve ne tu tişt e.

76

mîn navneteweyî bûye.

Lê heta ko li vê gerestêra me kurdên ko hatine kolekirin hebin, wê pirsgirêka kurdan jî her û her hebe.

FIRAT CEWERÎ: Ez bawer dikim yek ji sebebên girîng û bingehîn yê bindestmayîna kurdan ew e ku kurd nebûne



yek û nabin yek.

Ez dixwazûn pirsaxwe welê formule bikim; gelo tu xurtî an jî qelsiya civatekê bi çi ve girê didî?

Tifaq û yekbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifaq û berberî qelsî û jariya civatê ye.

Di vê cîhanê de mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayina hev ber barên hev, bi hevghana mirov û bi hevghandina xebatên wan hatine pê.

MiJet û dewletan bi tifaqê gihane bilindiya her tiştî û bi nifaqê ketine biniya kortala nayînê. Ji lewre mirov dikare bibêje heyîn di tifaqê de, neyîn di nifaqê de ye.

Xurtî û zexmiya yekbûnê di lehiyê de gelek qenc têt dîtin.

Çawan?

Lehî ji hevghana dilopên baranê pê ve ne tu tişt e.

76

Peşkên baranê gava ji hev cida û yek bi yek dikevin rûwê erdî, erd wan dadîqUrtîne.

Tihniya xwe pê vedikujîne. Lê gava digehin hev, hingî ji wan peşkên qels lehîke boş radibe. Dilop û peşkên baranê di yekbûnê di tifaqê de ne.

Erdê dilopxwer êdî di destên wan de lehîstokek e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdî re dileyizin; sînga wî qul dîkin, têdikevin, bilindiyên wî hildiweşînin, kendalên wî diqelişînin.

Lehî wek hûtekî har û hêç radibe ser xwe, ji pal û kaş û newalan dadixure. Li ber wê tu kes, tU tişt; bican, bêcan nema dikare bisekine. Lat, zinar, kevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtiya tifaqa dilopan ditewînin û lehî, ew şehînşehê yekbûnê mîna çilowên sivik dide pêşiya xwe, rêş dike, dimale.

Te çima ev mînak da mamoste? Ma çî têtîliya dilopên  
baranê û lehiyê bi kurdan re heye?  
Kurd ji hev cuda dilopên baranê ng, cihê cihê têne daqurtandin.  
Ko gihane hev dibin lehî. Ighîke boş, tu tişt li ber  
wan nikare bisekine.  
Felata welatê me di rabûna vê lehjyê de ye.

\* \* \*

77

Peşkên baranê gava ji hev cida û yek bi yek dikevin rûwê erdî,  
erd wan dadîqUrtîne.  
Tihniya xwe pê vedikujîne. Lê gava digehin hev, hingî ji  
wan peşkên qels lehîke boş radibe. Dilop û peşkên baranê di  
yekbûnê di tifaqê de ne.  
Erdê dilopxwer êdî di destên wan de lehîstokek e. Ew serdestên  
erdî ne. Bi erdî re dileyizin; sînga wî qul dîkin, têdikevin,  
bilindiyên wî hildiweşînin, kendalên wî diqelişînin.  
Lehî wek hûtekî har û hêç radibe ser xwe, ji pal û kaş û newalan  
dadixure. Li ber wê tu kes, tU tişt; bican, bêcan nema  
dikare bisekine. Lat, zinar, kevir, rêl, dar, direh serên xwe li  
ber xurtiya tifaqa dilopan ditewînin û lehî, ew şehînşehê  
yekbûnê mîna çilowên sivik dide pêşiya xwe, rêş dike, dimale.  
Te çima ev mînak da mamoste? Ma çî têtîliya dilopên  
baranê û lehiyê bi kurdan re heye?  
Kurd ji hev cuda dilopên baranê ng, cihê cihê têne daqurtandin.  
Ko gihane hev dibin lehî. Ighîke boş, tu tişt li ber  
wan nikare bisekine.  
Felata welatê me di rabûna vê lehjyê de ye.

\* \* \*

77

FIRAT CEWERÎ: Ehmedê Xanî jî berî bi sê sed salî behsa yekîtî û tifaqa kurdan kiriye. Iro hin kes wî mîna avakarê fikra nasyonalîzma kurdî dibînin. Lê bi a min ew saîrekî pir mezin e jî. Di nava klasîkên kurdî de cihekî wî yê taybetî heye. Ez dizanim ku te gelekî guh daye şaîrên me yên klasîk. Ez ê di pêvajoya vê hevpeyvînê de bixwazim ji cenabê te li ser wan û jiyana wan hin pirsan bipirsim. Herçiqasî em hinekî wan nas dikin jî, lê bihîstina ji devê te qîmetekî din dide wan. Berî ku ez di derheqa şaîrên me yên klasîk de bipirsim, ez dixwazim vê bipirsim; gelo klasîzm çi ye?

Di edebiyata milletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasîkan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahir û edîbên klasîk rabûne. Ji wan edîb û şahiran bi xwe re jî klasîk dibêjin. Ewan edîbên ha teqlîdî edîb û şahirên yewnan û latînî dikirin û li gora isûl û qeydeyên wan dinivîsandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yanî gelek isûl û şikilperest bûn.

Gelo klasîsm bi tenê di edebiyatê de heye, an di şaxên din yên hunerê de jî heye?

Ji edebiyatê pê ve ji her tiştî re ko di wextê kevin de û bi islû-beke bijarte hate çêkirin klasîk dibêjin. Di warê musîqiyê de jî klasîsm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasîk dibêjin. Mîmariya klasîk jî heye. Xulase herçî fen û sinhetên ko bi wê rêzikê ve çûne ji wan re klasîk dibêjin.

78

FIRAT CEWERÎ: Ehmedê Xanî jî berî bi sê sed salî behsa yekîtî

û tifaqa kurdan kiriye. Iro hin kes wî mîna avakarê fikra nasyonalîzma kurdî dibînin. Lê bi a min ew saîrekî pir mezin e jî. Di nava klasîkên kurdî de cihekî wî yê taybetî heye. Ez dizanim ku te gelekî guh daye şairên me yên klasîk. Ez ê di pêvajoya vê hevpeyvînê de bixwazim ji cenabê te li ser wan û jiyana wan hin pirsan bipirsim. Herçiqasî em hinekî wan nas dikin jî, lê bihîstina ji devê te qîmetekî din dide wan. Berî ku ez di derheqa şairên me yên klasîk de bipirsim, ez dixwazim vê bipirsim; gelo klasîzm çi ye?

Di edebiyata milletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasîkan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahir û edîbên klasîk rabûne. Ji wan edîb û şahiran bi xwe re jî klasîk dibêjin. Ewan edîbên ha teqlîdî edîb û şahirên yewnan û latînî dikirin û li gora isûl û qeydeyên wan dinivîsandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yanî gelek isûl û şikilperest bûn.

Gelo klasîsm bi tenê di edebiyatê de heye, an di şaxên din yên hunerê de jî heye?

Ji edebiyatê pê ve ji her tiştî re ko di wextê kevin de û bi islû-beke bijarte hate çêkirin klasîk dibêjin. Di warê musîqiyê de jî klasîsm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasîk dibêjin. Mîmariya klasîk jî heye. Xulase herçî fen û sinhetên ko bi wê rêzikê ve çûne ji wan re klasîk dibêjin.

78

79

Ger tu hin mînakan ji klasîkên kurdan bidî, tu ê navê kê bi bîr bînî? Rewsa edebiyata kurdî ya klasîk çi bû?

Bersiva vê pirsyarê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe ji eserên beriya islamiyetê hesêb tiştê ne maye. Piştî islamiyetê ji nav kurdan gelek şahir, edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine; û ji wan millet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahirên tirkan ên mezin yê ko serê tirkan bilind dikan Nabî, Nefhî û Fizûlî her sê jî kurdmanc in. Yê ko bi kurdmancî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zimên û çêtir kêfa xwe ji pirsên erebî û farisî re anîne.

Le hinan jî bi kurdî nivîsandine. Tu wan çawan dinirxî-nî?

Digel vê hindê evçend eserên ko pêşyan ji me re hiştine edebiyata me a klasîk ditînin pê û di nav wan de eserine kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nîzing de folklorê tu milletî ne gihîştîye dereca folklorê me.

Di derheqa saîrên me yê klasîk de di destên te de tu wesîqe hene?

Di destên me de tu wesîqe nînin. Tîjtên ko ez pê dizanim,

80

Ger tu hin mînanan ji klasîkên kurdan bidî, tu ê navê kê bi bîr bînî? Rewsa edebiyata kurdî ya klasîk çî bû?

Bersiva vê pirsyarê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe ji eserên beriya islamiyetê hesêb tiştê ne maye. Piştî islamiyetê ji nav kurdan gelek şahir, edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine;

û ji wan millet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahirên tirkan ên mezin yên ko serê tirkan bilind dikin Nabî, Nefhî û Fizûlî her sê jî kurdmanc in. Yên ko bi kurdmancî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zimên û çêtir kêfa xwe ji pirsên erebî û farisî re anîne.

Le hinan jî bi kurdî nivîsandine. Tu wan çawan dinirxî-nî?

Digel vê hindê evçend eserên ko pêşiyar ji me re hiştine edebiyata me a klasîk ditînin pê û di nav wan de eserine kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nîzing de folklorê tu milletî ne gihîştîye dereca folklorê me.

Di derheqê saîrên me yê klasîk de di destên te de tu wesîqe hene?

Di destên me de tu wesîqe nînin. Tîjtên ko ez pê dizanim, 80

min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdirehmanê Garisî bihîstine. Ji milê din ji kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyata kurdî hin not hene.

Di hin çavkaniyên kurdan de tê gotin ku şairê me yê pêşî Elî Herîrî ye. Eleksandr Jaba di derheqê Elî Herîrî de çi dibêje?

Melayê Jaba der heqê Elî Herîrî dibêje: "Şahirê berê Elî Herîrî ye. Dîwançeyek heye, şahir û qesayid. Herîr jî gundek e, di cihê û nehya Şemdînan, di sencaxa Hekariyan de, û şahir û ebyadê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meşûr û marûf

e. Texmîna ko di tarîxa çar sedê hicretê de peyda bûye û di nav Herîrê de medfun e."

Ez ê pasê di heqê Melayê Cizîrî de ji te bipirsim, lê ez pê-sî dixwazim bizanibim ka gelo Melayê Jaba di heqê Melayê Cizîrî de çi dibêje?

Melayê Jaba di heqê Melayê Cizîrî de dibêje: "Şahirê diwê Melayê Cizîrî ye. Eslê wî ji Cizîra Bihtan e. Navê wî Şêx Ehmed e. Di tarîxa pencsed û çilî de di nêv Cizîrê de peyda bûye. Dî wî wextî Mîr Imadedîn li Cizîrê mîr bû û xweheke mîr hebû. Ev şêx Ehmed li xweha mîr aşîq bûye. Xezeliyatine zehf gotiye û dîwançeyek tertîb kiriye. Dîwana Melayê Cizîrî dibêjin qewî dîwaneke misteleh e, û zehf li nik ekradan maqûl e. Paşê Mîr Imadedîn ew şêx Ehmed ceribandîye ko aşîqê heqîqî ye û xweha xwe da ê. Şêx Ehmed qebûl ne 81

min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdirehmanê Garisî bihîstine. Ji milê din ji kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyata kurdî hin not hene.

Di hin çavkaniyên kurdan de tê gotin ku şairê me yê pêsi Elî Herîrî ye. Eleksandr Jaba di derheqa Elî Herîrî de çi dibêje?

Melayê Jaba der heqê Elî Herîrî dibêje: "Şahirê berê Elî Herîrî ye. Dîwançeyek heye, şîhir û qesayid. Herîr jî gundek e, di cihê û nehya Şemdînan, di sencaxa Hekariyan de, û şîhir û ebyadê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meşhûr û marûf e. Texmîna ko di tarîxa çar sedê hicretê de peyda bûye û di nav Herîrê de medfun e."

Ez ê pasê di heqê Melayê Cizîrî de ji te bipirsim, lê ez pê-

sî dixwazim bizanibim ka gelo Melayê Jaba di heqê Melayê Cizîrî de çi dibêje?

Melayê Jaba di heqê Melayê Cizîrî de dibêje: "Şahirê diwê Melayê Cizîrî ye. Eslê wî ji Cizîra Bihtan e. Navê wî Şêx Ehmed e. Di tarîxa pencsed û çilî de di nêv Cizîrê de peyda bûye. Dî wî wextî Mîr Imadedîn li Cizîrê mîr bû û xweheke mîr hebû. Ev şêx Ehmed li xweha mîr aşîq bûye. Xezeliyatine zehf gotiye û dîwançeyek tertîb kiriye. Dîwana Melayê Cizîrî dibêjin qewî dîwaneke misteleh e, û zehf li nik ekradan maqûl e. Paşê Mîr Imadedîn ew şêx Ehmed ceribandiye ko aşîqê heqîqî ye û xweha xwe da ê. Şêx Ehmed qebûl ne 81

kiriye. Ev şêx Ehmed jî di tarîxa pansed û pêncî û şesê de merhûm bûye û di nêv Cizîrê de medfun e. . . Dibêjin ku Melayê Cizîrî berdevkê Mîrê Cizîrê bû, ma rast e?

Berdevkê mîrê Cizîrê bû. Lê carekê jê enirî û çû bû Diyarbêkrê. Mideke xweş li wê maye, birek ji şîhrên xwe li Diyarbêkrê nivîsandiye. Lê paşê dîsan vegeriya û hati bû Cizîrê. Salên xwe di welatê xwedêdana xwe de qedandine.

Tu dikarî hinekî Melê tarîf bikî? Ji ber ku tu resimê wî di destê me de nîne, em nizanin ka ew mirovekî çawan bû?

Bejna melê ne kurt ne dirêj, lê navîn bû. Rûwê wî girover, sipî û sor bû. Çav û birhên wî reş bûn. Riha wî sivik bû. Guliyên wî hebûn dihatin heta ber guhê wî. Por, rih û guliyên wî hergav şehkirî bû. Eniya wî fireh, stowê wî drêj bû. Rêveçûna wî bi lez bû. Keviyek davêt ser serê xwe, yeke din jî li



ser dipêçand. Xeftanek li ber bû. Pêlaveke sor têxiste pâyên xwe. Eba werdigirt. Hergav bi ken bû. Bi dora xwe re xweş dikir, dilê xelkê ji xwe ne dihişt.

Li gorî gotina Jaba wê Mela li Cizîrê çûbe rehma. . . Mela li Cizîrê çûye rehma. Di taxa Torê di Medresa-sor de

82

kiriye. Ev şêx Ehmed jî di tarîxa panned û pêncî û şesê de merhûm bûye û di nêv Cizîrê de medfun e. . . Dibêjin ku Melayê Cizîrî berdevkê Mîrê Cizîrê bû, ma rast e?

Berdevkê mîrê Cizîrê bû. Lê carekê jê enirî û çû bû Diyarbekrê. Mideke xweş li wê maye, birek ji şîhrên xwe li Diyarbekrê nivîsandiye. Lê paşê dîsan vegeriya û hati bû Cizîrê. Salên xwe di welatê xwedêdana xwe de qedandine.

Tu dikarî hinekî Melê tarîf bikî? Ji ber ku tu resimê wî di destê me de nîne, em nizanin ka ew mirovekî çawan bû?

Bejna melê ne kurt ne dirêj, lê navîn bû. Rûwê wî girover, sipî û sor bû. Çav û birhên wî reş bûn. Riha wî sivik bû. Guliyên wî hebûn dihatin heta ber guhê wî. Por, rih û guliyên wî her gav şehkirî bû. Eniya wî fireh, stowê wî drêj bû. Rêveçûna wî bi lez bû. Keviyek davêt ser serê xwe, yeke din jî li ser dipêçand. Xeftanek li ber bû. Pêlaveke sor têxiste pâyên xwe. Eba werdigirt. Hergav bi ken bû. Bi dora xwe re xweş dikir, dilê xelkê ji xwe ne dihişt.

Li gorî gotina Jaba wê Mela li Cizîrê çûbe rehma. . . Mela li Cizîrê çûye rehma. Di taxa Torê di Medresa-sor de

82

veşartî ye. Tirba Melê ziyaretgeh e, xelk gelek qedrê wî dizanin.  
Tiştê ku em dizanin tirba Melê pir spehî hatibû avakirin,  
gelo ew tirb hê jî heye?

Tirba Melê qenc hatibû ava kirin. Lê vê paşiyê tirba wî xirab  
kirine. Eskerên tirk kêlên wê şikênandin kevirên dora wê birin  
û ji xwe re quçên tifingan çêkirin.

Feqeh û melayên Kurdistanê qîmeteke çawan didin Melê?  
Feqehên Kurdistanê dîwana wî bi destên xwe re digerînin.  
Hin beytên wî ji ber dikin û qesîdeyên wî di civatan de dixwînin.  
Gelo Melayê Cizîrî ji zimanê xwe pê ve bi tu zimanên  
din dizanî bû?

Mela ji zimanê xwe pêve bi farisî, erebî û tirkî jî dizanî bû.  
Şaîrekî me î din jî heye ku di warê şîîrê de hoste bû. Ew  
jî Feqehê Teyran e. Wî ji me re gelek berhem hiştine. Ez  
bawer dikim ew feqehê Melayê Cizîrî bû, li ber destê  
Melayê Cizîrî gihîstibû. Tu di vî warî de çi dibêjî mamoste?  
83

veşartî ye. Tirba Melê ziyaretgeh e, xelk gelek qedrê wî dizanin.  
Tiştê ku em dizanin tirba Melê pir spehî hatibû avakirin,  
gelo ew tirb hê jî heye?

Tirba Melê qenc hatibû ava kirin. Lê vê paşiyê tirba wî xirab  
kirine. Eskerên tirk kêlên wê şikênandin kevirên dora wê birin  
û ji xwe re quçên tifingan çêkirin.

Feqeh û melayên Kurdistanê qîmeteke çawan didin Melê?  
Feqehên Kurdistanê dîwana wî bi destên xwe re digerînin.  
Hin beytên wî ji ber dikin û qesîdeyên wî di civatan de dixwînin.  
Gelo Melayê Cizîrî ji zimanê xwe pê ve bi tu zimanên  
din dizanî bû?

Mela ji zimanê xwe pêve bi farisî, erebî û tirkî jî dizanî bû. Şaîrekî me î din jî heye ku di warê şîrê de hoste bû. Ew jî Feqehê Teyran e. Wî ji me re gelek berhem hiştine. Ez bawer dikim ew feqehê Melayê Cizîrî bû, li ber destê Melayê Cizîrî gihîstibû. Tu di vî warî de çi dibêjî mamoste?

83

Ber destên wî gelek feqeh bi xwedî bûne. Feqehê-Teyran jî, ji feqehên melê bû.

Eleksandr Jaba di derheqa Feqehê Teyran de çi dibêje gelo? Wî çawan dide naskirin?

Melayê Jaba di heqê Feqehê Teyran de gotiye: "Şahirê siysFeqiyê Teyran e ko navê wî Mihemed e. Eslê wî ji qeseba Miksê ye, welatê Hekaryan e. Di tarîxa hefsed û diwê peyda bûye. "Hikayeta Şêxê Senhanî" û "Qiseya Bersîsayî" jî mewzûn gotiye û "Qewlê Hespê reş" wisanî mewzûn gotiye û zehf beyt û eşhar jî di şîhrê da "Mîm û Hey" e, û miqdarê heftê û pênc salan emir kiriye û di tarîxa heft sed û heftê û heft da merhûm bûye û li Miksê jî medfun e."

Ez dixwazim li vir beytekê ji saîrekî me î klasîk bixwînim. Nizanim gelo wê cenabê te bi zanibe ew kî ye?

Hemdê bêhed bo Xudayê alemîn

Wî Xudayê daye me dînê mibîn

Em kirine umeta xeyrel beşer

Tabihî wî miqtedayê namiwer

Wî Xudayê malikê milkê ezîm

Daye me mîras qurana kerîm

Melayê Bate.

Rast e mamoste, te tê derxist, ev ya Melayê Batê ye. Ji

85

Ber destên wî gelek feqeh bi xwedî bûne. Feqehê-Teyran jî, ji feqehên melê bû.

Eleksandr Jaba di derheqa Feqehê Teyran de çi dibêje gelo? Wî çawan dide naskirin?

Melayê Jaba di heqê Feqehê Teyran de gotiye: "Şahirê siysFeqiyê Teyran e ko navê wî Mihemed e. Eslê wî ji qeseba Miksê ye, welatê Hekaryan e. Di tarîxa hefsed û diwê peyda bûye. "Hikayeta Şêxê Senhanî" û "Qiseya Bersîsayî" jî mewzûn gotiye û "Qewlê Hespê reş" wisanî mewzûn gotiye û zehf beyt û eşhar jî di şîhrê da "Mîm û Hey" e, û miqdarê heftê û pênc salan emir kiriye û di tarîxa heft sed û heftê û heft da merhûm bûye û li Miksê jî medfun e."

Ez dixwazim li vir beytekê ji saîrekî me î klasîk bixwînim. Nizanim gelo wê cenabê te bi zanibe ew kî ye?

Hemdê bêhed bo Xudayê alemîn

Wî Xudayê daye me dînê mibîn

Em kirine umeta xeyrel beşer

Tabihî wî miqtedayê namiwer

Wî Xudayê malikê milkê ezîm

Daye me mîras qurana kerîm

Melayê Bate.

Rast e mamoste, te tê derxist, ev ya Melayê Batê ye. Ji

85

Mewlûdê bû. Min hê di salên xwe yên gelekî biçûk de ev mewlûd ji ber kiribû. Hê jî gelek ji wê di bîra min de maye. Erê min ji ber kiribû, lê navê nivîskarê wê ji bîra min çûbû. Mîna niha, mirov carinan hin pirtûkan dixwî-

ne, navê pirtûkê di bîra mirov de dimîne, lê navê nivîskêr ji bîra mirov diçe. Çîroka min û Mewlûd û nivîskarê wê Melayê Bate jî welê bû. Erê ez niha dizanim ku Melayê Bate mewlûd nivîsandiyê, lê divê ez mikur werim ku ez di derheqa jiyana wî de zêde tistekî nizanim. Ew kî bû, ji ku bû, ji bilî mewlûdê tijtekî din nivîsandibû an na, ez pê nizanim. Ji xwe cenabê te di destpêkê de gotibû ku di derheqa van klasîkan de ji kitêba Jaba pêve zêde çavkanî tunene. Ger tu ji kerema xwe re dîsan ji Jaba Melayê Bate jî bi me bidî naskirin, ez ê gelekî kêfxweş bibim.

Melayê Jaba der heqê Melayê Bate gotiyê: "Navê wî jî Mela Ehmed e. Eslê wî ji Bate ye. Bate gundek e, ji gundê di Hekariyan. Di tarîxa heşt sed û bîstî da peyda bûye, û zehfşahir û ebyat gotine. Dîwaneke mexsûs heye, qewî qenc e, û mewlûdeke kurmancî gotiyê. Di Kurdistanê de ew meqbûl e; û heştê salî emir kiriye û neh sedê hicrî merhûm bûye. Di nêv gundê Bate de jî mdefun e".

Mîrza Jaba dibêje ku dîwaneke wî û gelek şîrên wî hene. Lê bi tenê mewlûda wî di destê me de ye. Gelo ji bilî mewlûdê cenabê te tiştekî wî dîtiye?

86

Mewlûdê bû. Min hê di salên xwe yê gelekî biçûk de ev mewlûd ji ber kiribû. Hê jî gelek ji wê di bîra min de maye. Erê min ji ber kiribû, lê navê nivîskarê wê ji bîra min çûbû. Mîna niha, mirov carinan hin pirtûkan dixwîne, navê pirtûkê di bîra mirov de dimîne, lê navê nivîskêr

ji bîra mirov diçe. Çîroka min û Mewlûd û nivîskarê wê Melayê Bate jî welê bû. Erê ez niha dizanim ku Melayê Bate mewlûd nivîsandiye, lê divê ez mikur werim ku ez di derheqa jiyana wî de zêde tistekî nizanim. Ew kî bû, ji ku bû, ji bilî mewlûdê tijtekî din nivîsandibû an na, ez pê nizanim. Ji xwe cenabê te di destpêkê de gotibû ku di derheqa van klasîkan de ji kitêba Jaba pêve zêde çavkanî tunene. Ger tu ji kerema xwe re dîsan ji Jaba Melayê Bate jî bi me bidî naskirin, ez ê gelekî kêfxweş bibim.

Melayê Jaba der heqê Melayê Bate gotiye: "Navê wî jî Mela Ehmed e. Eslê wî ji Bate ye. Bate gundek e, ji gundê di Hekariyan. Di tarîxa heşt sed û bîstî da peyda bûye, û zehfşahir û ebyat gotine. Dîwaneke mexsûs heye, qewî qenc e, û mewlûdeke kurmancî gotiye. Di Kurdistanê de ew meqbûl e; û heştê salî emir kiriye û neh sedê hicrî merhûm bûye. Di nêv gundê Bate de jî mdefun e".

Mîrza Jaba dibêje ku dîwaneke wî û gelek şîrên wî hene. Lê bi tenê mewlûda wî di destê me de ye. Gelo ji bilî mewlûdê cenabê te tişteki wî dîtiye?

86

Ji eserên Bate min bi tenê mewlûda wî dîtiye. Herçî dîwan û şîhirên wî ne, çavên min bi wan ne ketiye.

Gelo cara pêjî mewlûda Batê kengî û li ku hate çapkirin?

Mewlûda wî di sala 1905an de li Misrê hate çap kirin. Heke ez ne şaş im ew mewlûd di sala 1919311 de li Stenbolê ketiye çapê. Bi min re nisxeke destnivîs heye.

Mela Camî di der heqê Mewlana Celaledînê Rûmî û kitêba wî "Mesnewî" de gotiye: "Ez çi bibêjim, ew ne pêxember e, lê kitêba wî heye?"

Tu dikarî di der heqê Xanîyê xwedî kitêb de çi bibêjî?  
Ev pesnekî bilind û hêja û bi her awayî li bejna Mewlana têt.  
Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî "Memozîn" de, bi min be, mirov dikare jê bêtir jî bibêje. Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a milî, pêxemberê ola me a nijadîn.

Çawan mamoste, tu çawan dikarî tistekî welê bibêjî? Ma Xanî çi kiriye ku ew pêxemberê ola me a nijadî be?

Xanî di wextekî welê de rabû ko. . . ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hêj li miliyet û li nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelumên ji yek milletî hev û du ji bo katolîkî an protestaniyê dikustin. Di heyameke welê de Ehmedê Xanî bîra miliyeta xwe, bîra kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon

87  
Ji eserên Bate min bi tenê mewlûda wî dîtiye. Herçî dîwan û şîhirên wî ne, çavên min bi wan ne ketiye.

Gelo cara pêjî mewlûda Batê kengî û li ku hate çapkirin?

Mewlûda wî di sala 1905an de li Misrê hate çap kirin. Heke ez ne şaş im ew mewlûd di sala 1919311 de li Stenbolê ketiye çapê. Bi min re nisxeke destnivîs heye.

Mela Camî di der heqê Mewlana Celaledînê Rûmî û kitêba wî "Mesnewî" de gotiye: "Ez çi bibêjim, ew ne pêxember e, lê kitêba wî heye?"

Tu dikarî di der heqê Xanîyê xwedî kitêb de çi bibêjî?  
Ev pesnekî bilind û hêja û bi her awayî li bejna Mewlana têt.

Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî "Memozîn" de, bi min be, mirov dikare jê bêtir jî bibêje. Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a milî, pêxemberê ola me a nijadîn.

Çawan mamoste, tu çawan dikarî tistekî welê bibêjî? Ma Xanî çi kiriye ku ew pêxemberê ola me a nijadî be?

Xanî di wextekî welê de rabû ko. . . ne li cem me, lê li Ewropayê jî xelk hêj li miliyet û li nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelumên ji yek milletî hev û du ji bo katolîkî an protestaniyê dikustin. Di heyameke welê de Ehmedê Xanî bîra miliyeta xwe, bîra kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon  
87

berî her tiştî kurd in, rabin ser xwe, dewleteke kurdî çêkin û bindestiya miltên din mekin.

Gelo Ehmedê Xanî ji ku ye? Ew jî ne ji Hekaryan be?

Melayê Jaba der heqê Ehmedê Xanî de gotiye: "Şahirê pêncê jî Ehmedê Xanî ye. Eslê wî ji tayfeyê Hekaryan ji eşîreta Xaniyan e. Bi xwe hatiye Beyazidê, di tarîxa hezarî da tewetin kiriye. Di zimanê kurmancî de Memozîn nav kitêbek aşiq û masûqan gotiye û kitêbek lixê jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê wê Nûbihar e. Zarokê di Kurdistanê hemû di piştî quranê dixwînin. O zehfji xezeliyat û eşharan û beyt bi zimanê kurmancî gotiye. O di zimanê erebî û farisî û tirkî jî qewî mahir û sahibî îrfan e. O ji şîerayê di Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û faiq e, belkî ji hemû şîeran meqbûl û memduh e. O di hezar û şêst û sê da ji merhûm bûye û di nêv Beyazidê da mizgeftê jî bi navê xwe bîna kiriye. O bi xwe jî li kenarê mizgeftê medfun e".



Herçiqas zimanê Melayê Jaba ne zêde paqij bû jî, dîsan dîroka bûyina Xanî hat fehmkirin. Le belê ez nizanim wî kengî emirê Xwedê kiriye?

Kengî emirê Xwedê kiriye em pê nizanin. Lê gava Memozîna xwe qedandiye çil û çar salî bû.

Gelo ji Mem û Zînê pê ve çi eserên Xanî yên din hene?

88

berî her tiştî kurd in, rabin ser xwe, dewleteke kurdî çêkin û bindestiya miltên din mekin.

Gelo Ehmedê Xanî ji ku ye? Ew jî ne ji Hekaryan be?

Melayê Jaba der heqê Ehmedê Xanî de gotiye: "Şahirê pêncê jî Ehmedê Xanî ye. Eslê wî ji tayfeyê Hekaryan ji eşîreta Xaniyan e. Bi xwe hatiye Beyazidê, di tarîxa hezarî da tewetin kiriye. Di zimanê kurmancî de Memozîn nav kitêbek aşiq û masûqan gotiye û kitêbek lixêt jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê wê Nûbihar e. Zarokê di Kurdistanê hemû di piştî quranê dixwînin. O zehfji xezeliyat û eşharan û beyt bi zimanê kurmancî gotiye. O di zimanê erebî û farisî û tirkî jî qewî mahir û sahibî îrfan e. O ji şîerayê di Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û faiq e, belkî ji hemû şîeran meqbûl û memduh e. O di hezar û şêst û sê da ji merhûm bûye û di nêv Beyazidê da mizgeftê jî bi navê xwe bîna kiriye. O bi xwe jî li kenarê mizgeftê medfun e".

Herçiqas zimanê Melayê Jaba ne zêde paqij bû jî, dîsan dîroka bûyina Xanî hat fehmkirin. Le belê ez nizanim wî kengî emirê Xwedê kiriye?

Kengî emirê Xwedê kiriye em pê nizanin. Lê gava Memozîna xwe qedandiye çil û çar salî bû.

Gelo ji Mem û Zînê pê ve çî eserên Xanî yê din hene?

88

Xanî ji Memozînê pê ve hin eserên din jî hene. Nûban ferhengeke menzûm e. Kurdî-Erebî. Li gora tiştê ko min bihîstiye Xanî kitêbeke cexrafyayê jî çêkiriye û tê de qala ezman û stêrkan kiriye. Herçend ez gelek lê geriya bim jî ev kitêb ne ket destên min.

Bîska din cenabê te got, ku Xanî pêxemberekî nijadê kurd e, lê.wî berhemeke evînî nivîsandiye. Ma mirov bi nivîsandina berhemeke evînî dikare di warê milî û nijadî de ewqasî bilind bibe? Gelo bi rastî Xanî bi tenê berhemeke evînî nivîsandiye, an jî ew kiriye behane da ku bikaribe pê fikrên xwe yê milî bîne zimên?

Ehmedê Xanî herwekî bi xwe gotiye, Mem û Zîh ji xwe re kirine behane û bi vê hêncetê kula dilê xwe bi dar daye, derdê milletê xwe ê ker û lal bi ziman kiriye û ew axivandiye.

Mem û Zîn ji bo Ehmedê Xanî remzên Kurdistanê, rêzikên welatê wî ne. Xanî dibîne ko ew rêzik wînda dibin, kurdmanc bi zimanine din dixwînin û dinivîsînin, bi rêzikên milletên din ve diçin, belgên xwe ên nijadî jî xwe tavêjin, dikevin rengê milletên din û bi vî awayî û bi rêva bindestiya wan dikin.

Ji bo vê nirxandina te gelekî spas mamoste. Ez bawer dikim êdî piraniya kurdan bi vê fikra Xanî hesiyane. Berê ne welê bû. Hema ne zûde jî. Berî bi panzdeh-bîst salan gava mirov navê Xanî dianî zimên, gelean ji xortên me digotin Xanî pasverû ye, ew îdealîst e. Tu zanî ji bo çî, ji

89

Xanî ji Memozînê pê ve hin eserên din jî hene. Nûban ferhengeke menzûm e. Kurdî-Erebî. Li gora tiştê ko min bihîstiye Xanî kitêbeke cexrafyayê jî çêkiriye û tê de qala ezman û stêrkan kiriye. Herçend ez gelek lê geriya bim jî ev kitêb ne ket destên min.

Bîska din cenabê te got, ku Xanî pêxemberekî nijadê kurd e, lê.wî berhemeke evînî nivîsandiye. Ma mirov bi nivîsandina berhemeke evînî dikare di warê milî û nijadî de ewqasî bilind bibe? Gelo bi rastî Xanî bi tenê berhemeke evînî nivîsandiye, an jî ew kiriye behane da ku bikaribe pê fikrên xwe yên milî bîne zimên?

Ehmedê Xanî herwekî bi xwe gotiye, Mem û Zîh ji xwe re kirine behane û bi vê hêncetê kula dilê xwe bi dar daye, derdê milletê xwe ê ker û lal bi ziman kiriye û ew axivandiye.

Mem û Zîn ji bo Ehmedê Xanî remzên Kurdistanê, rêzikên welatê wî ne. Xanî dibîne ko ew rêzik winda dibin, kurdmanc bi zimanine din dixwînin û dinivîsînin, bi rêzikên milletên din ve diçin, belgên xwe ên nijadî ji xwe tavêjin, dikevin rengê milletên din û bi vî awayî û bi rêva bindestiya wan dikin.

Ji bo vê nirxandina te gelekî spas mamoste. Ez bawer dikim êdî piraniya kurdan bi vê fikra Xanî hesiyane. Berê ne welê bû. Hema ne zûde jî. Berî bi panzdeh-bîst salan gava mirov navê Xanî dianî zimên, gelek ji xortên me digotin Xanî pasverû ye, ew îdealîst e. Tu zanî ji bo çî, ji

89  
ber ku piraniya xortên me xwe materyalîst didîtin û kesên ku ji tradisyona medreseyan dihatin jî paşverû û kevneperst

didîtin. Ez nabêjim hemûyan bi vî çavî li wan dinêrin,  
lê belê piraniya xortên me bi çavekî welê li wan  
dinêrî. Divê ez mikur werim ku niha rewş hatiye guhertin,  
niha piraniya kurdan li Xanî xwedî derdikevin, navê  
Cizîrî û Feqehê Teyran bi bîr tînin, xwe bi wan serbilind  
hîs dikin. Wê ji ber vê hisyarî û têgihîştinê be ku piraniya  
kurdan par sêsedsalîya nivîsandina Mem û Zînê pîroz  
kirin. Ew jî êdî bi hêla Xanî ya kurdayetiyê hesiyane.  
Heta gelek nivîskar û rewsenbîran li ser Xanî kitêb nivî-  
sandin. Vêca her kes tiştêkî li ser wî dibêjin. Hin kes dibêjin,  
na, ew ne îdealîst bû, lê belê materyalîst bû, baweriya  
xwe bi diyalektîkê dianî, hinin din behsa erotîzmê  
di Mem û Zînê de dikin, hinek jî li ser aliyê wî yê milî  
radiwestin. Bi a min ev tiştêkî rast e û kêfa mirov tîne.  
Lê ez ê kêfxwestir bibim ku cenabê te mînakekê ji şîreke  
Xanî bîne ku mirov tê de bi rastî fikrên milî bibîne:

Seyda dibêje:

Sazî dili kul bi zîr û bem bit  
Sazendeyê eşqi Zîn û Mem bit  
Şerha xemi dil bikim fesane  
Zînê û Memî bikim behane  
Nexmê we ji perdeyê derînim  
Zînê û Memî ji nû ve vejînim  
Derman bikim ez ewan dewa kim

9j

ber ku piraniya xortên me xwe materyalîst didîtin û kesên  
ku ji tradisyona medreseyan dihatin jî paşverû û kevneperst  
didîtin. Ez nabêjim hemûyan bi vî çavî li wan dinêrin,

lê belê piraniya xortên me bi çavekî welê li wan  
dinêrî. Divê ez mikur werim ku niha rewş hatiye guhertin,  
niha piraniya kurdan li Xanî xwedî derdikevin, navê  
Cizîrî û Feqehê Teyran bi bîr tînin, xwe bi wan serbilind  
hîs dikin. Wê ji ber vê hisyarî û têgihîştinê be ku piraniya  
kurdan par sêsedesaliya nivîsandina Mem û Zînê pîroz  
kirin. Ew jî êdî bi hêla Xanî ya kurdayetiyê hesiyane.  
Heta gelek nivîskar û rewsenbîran li ser Xanî kitêb nivî-  
sandin. Vêca her kes tiştêkî li ser wî dibêjin. Hin kes dibêjin,  
na, ew ne îdealîst bû, lê belê materyalîst bû, baweriya  
xwe bi diyalektîkê dianî, hinin din behsa erotîzmê  
di Mem û Zînê de dikin, hinek jî li ser aliyê wî yê milî  
radiwestin. Bi a min ev tiştêkî rast e û kêfa mirov tîne.  
Lê ez ê kêfxwestir bibim ku cenabê te mînakekê ji şîîreke  
Xanî bîne ku mirov tê de bi rastî fikrên milî bibîne:  
Seyda dibêje:

Sazî dili kul bi zîr û bem bit  
Sazendeyê eşqi Zîn û Mem bit  
Şerha xemi dil bikim fesane  
Zînê û Memî bikim behane  
Nexmê we ji perdeyê derînim  
Zînê û Memî ji nû ve vejînim  
Derman bikim ez ewan dewa kim  
9i  
Wan bê mededan ji nû ve rakim  
Meşhûr bikim bi terz û islûb  
Mimtaç bikim mihib û mehbûb  
Ewreng bikim ji nû serefrez

Da bîne temaşeyî nezerbaz  
Dilber li Memî bikim girînê  
Aşiq bikenin bi derdê Zînê.  
Ev meywe eger xerab e ger qenc  
Kêşaye digel wî me dused renc  
Ev meywe eger ne avdar e  
Kurdmancî ye ev qeder li kar e  
Ev tifle eger ne nazenîn e  
Nûbar e bi min qewî şêrîn e  
Ev meywe eger ne pir lezîz e  
Ev tifle bi min qewî ezîz e  
Mehbûb û libas û gûşware  
Milkê di min in ne mistear e.  
Ez pîlewer im ne gewherî me  
Xodrestê me ez ne perwerî me  
Kurdmanc im kûhî kenarî  
Ev çend xeber in di kurdewarî.  
Ji bo vê mînaka Xanî pir spas mamoste. Em dizanin ku  
pistî Xanî jî gelek seyda û melayên me derketine ku hem  
şîrên bi naveroka milî hem jî yên tasawifî nivîsandine.  
Gelek ji wan xwedîdîwan in jî. Herweha piraniya van şa-  
îrên me bi zaravayê kurmancî nivîsandine. Wek Smaîlê  
Beyazidî, Mirad-Xan, Axayok, Mewiana Xalid, Mela  
92  
Wan bê mededan ji nû ve rakim  
Meşhûr bikim bi terz û islûb  
Mimnaz bikim mihib û mehbûb  
Ewreng bikim ji nû serefrez

Da bîne temaşeyî nezerbaz  
Dilber li Memî bikim girînê  
Aşiq bikenin bi derdê Zînê.  
Ev meywe eger xerab e ger qenc  
Kêşaye digel wî me dused renc  
Ev meywe eger ne avdar e  
Kurdmancî ye ev qeder li kar e  
Ev tifle eger ne nazenîn e  
Nûbar e bi min qewî şêrîn e  
Ev meywe eger ne pir lezîz e  
Ev tifle bi min qewî ezîz e  
Mehbûb û libas û gûşware  
Milkê di min in ne mistear e.  
Ez pîlewer im ne gewherî me  
Xodrestê me ez ne perwerî me  
Kurdmanc im kûhî kenarî  
Ev çend xeber in di kurdewarî.

Ji bo vê mînaka Xanî pir spas mamoste. Em dizanin ku pistî Xanî jî gelek seyda û melayên me derketine ku hem şîrên bi naveroka milî hem jî yên tasawifî nivîsandine. Gelek ji wan xwedîdîwan in jî. Herweha piraniya van şarên me bi zaravayê kurmancî nivîsandine. Wek Smaîlê Beyazidî, Mirad-Xan, Axayok, Mewiana Xalid, Mela 92

Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdilqadirê Gêlanî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Evdirehmanê Taxê, Siyehpûs, Evdirehmanê Axtepî, Elî Teremaxî, Mela Ênisê Erqetînî, Melayê Erwasê û bi dehan saîrên din. Ma di nava

klasîkan de şairên ku bi zaravayê soranî nivîsandine nî-  
nin?

Nalî ji şairên Soran e.

Tu dîwanên Nalî çap bûne?

Dîwana wî di sala 19318 de li Bexdayê çap bûye û yê ko dî-  
wan dane çap kirin biserhatiya Nalî jî tê de gotine.

Gelek şairên me yê wê demê navên mistear bi kar dianîn,  
mamoste. Gelo Nalî jî navekî welê ye?

Jê dixuye ko Nalî leqeba şahir e navê wî Mela Xidir e , bavê  
wî Ehmed Şawês e.

Di derheqa bûyin û wefata Nalî de tu çavkanî di destên  
cenabê te hene?

Nalî di sala 12158 hîcrî de, li Şarezorê, ji diya xwe bûye. Di  
sala i255an de çûye Stenbolê û heta dawiya emrê xwe li Stenbolê  
ma û di sala i273an de emirê Xwedê kir. Li Stenbolê di  
gomistana Eba -eyûbê-ensarî de veşarti ye.

93

Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdilqadirê Gêlanî,  
Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Evdirehmanê Taxê, Siyehpûs,  
Evdirehmanê Axtepî, Elî Teremaxî, Mela Ênisê Erqetînî,  
Melayê Erwasê û bi dehan saîrên din. Ma di nava  
klasîkan de şairên ku bi zaravayê soranî nivîsandine nî-  
nin?

Nalî ji şairên Soran e.

Tu dîwanên Nalî çap bûne?

Dîwana wî di sala 19318 de li Bexdayê çap bûye û yê ko dî-  
wan dane çap kirin biserhatiya Nalî jî tê de gotine.

Gelek şairên me yê wê demê navên mistear bi kar dianîn,



mamoste. Gelo Nalî jî navekî welê ye?

Jê dixuye ko Nalî leqeba şahir e navê wî Mela Xidir e , bavê wî Ehmed Şawês e.

Di derheqa bûyin û wefata Nalî de tu çavkanî di destên cenabê te hene?

Nalî di sala 12158 hîcrî de, li Şarezorê, ji diya xwe bûye. Di sala i255an de çûye Stenbolê û heta dawiya emrê xwe li Stenbolê ma û di sala i273an de emirê Xwedê kir. Li Stenbolê di gomistana Eba -eyûbê-ensarî de veşarti ye.

93

Ez bawer dikim Şêx Riza jî sorî ye, ne welê?

Şêx Riza jî sorî ye. Ew jî çûye Stenbolê û li Stenbolê di civata şahir û zanan de gelek bi qedr û rûmet bûye. Dersa efendî û beglerên Stenbolê digot, nemaze bi farisî. Şêx Riza hecawekî bêeman bû. Mixabin ko tu şahirên wî bi min re nînin ko ez belav bikim.

Hecî Qadirê Koyî jî şaîrekî baş bûye mamoste. Ew jî wek gelek şaîrên wê demê li Stebolê bi cih bûbû. Ez bawer dikim min ji te bihîstibû, ku ew demekê li mala we jî mabû.

Heta te gotibû ku Hacî Qadirê Koyî li ser Memozîna bavê te ya destnivîs siîrek nivîsandibû. Gelo ew şîr tê bî-rate?

Hacî li ser Memozîna bavê min a destnivîs şihira jêrîn nivîsandiyê:

Zemane resmi caranî ne mawe

Çiraxi nazim û minşî kujawe

Le dewri ême roman û cerîde

Egerçî meqsed e, zanînî baw e

Eman qedrê bizane em kitêbe  
Le dinya êstekî hemtay ne maw  
Le eyamî heyatî şêxî Xanî  
Le ser nisxey xet ew nûsirawe  
Le layî erbabi xoy bo qedr û qiymet  
Xezîney gewher e, û kêsey diraw e

94

Ez bawer dikim Şêx Riza jî sorî ye, ne welê?  
Şêx Riza jî sorî ye. Ew jî çûye Stenbolê û li Stenbolê di civata  
şahir û zanan de gelek bi qedr û rûmet bûye. Dersa efendî û  
beglerên Stenbolê digot, nemaze bi farisî. Şêx Riza hecawekî  
bêeman bû. Mixabin ko tu şahirên wî bi min re nînin ko ez  
belav bikim.

Hecî Qadirê Koyî jî şaîrekî baş bûye mamoste. Ew jî wek  
gelek şaîrên wê demê li Stenbolê bi cih bûbû. Ez bawer dikim  
min ji te bihîstibû, ku ew demekê li mala we jî mabû.

Heta te gotibû ku Hacî Qadirê Koyî li ser Memozîna  
bavê te ya destnivîs siîrek nivîsandibû. Gelo ew şîir tê bî-  
rate?

Hacî li ser Memozîna bavê min a destnivîs şihira jêrîn nivî-  
sandiye:

Zemane resmi caranî ne mawe  
Çiraxi nazim û minşî kujawe  
Le dewri ême roman û cerîde  
Egerçî meqsed e, zanînî baw e  
Eman qedrê bizane em kitêbe  
Le dinya êstekî hemtay ne maw  
Le eyamî heyatî şêxî Xanî

Le ser nixey xet ew nûsirawe  
Le layî erbabi xoy bo qedr û qiymet  
Xezîney gewher e, û kîsey diraw e

94

Le mecmûhî diwel, Soran û Botan

Le sayey em kitêbe nasirawe

Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî

Esasî nezmî kurdî danenawe.

Min bihîstiyê te li gelek cihan pesnê Hacî daye, tu wî disibînî  
Xanî. Tu dikarî vê hebekî şirove bikî?

Hacî qadirê Koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê  
rniletê xwe dişewitî. Şehir û qesîdeyên wî tev de li ser millet  
û welêt in.

Hacî Qadir ji ku ye mamoste?

Hacî Qadir kurê Mela Ehmed e, di gundê Gorqeraçê de ji  
diya xwe bûye, û ji eşîra Zengenê ye. Lê ji ber ko di zarotiya  
xwe de guhastiyê Koyê navê "koyî" pê ve bûye.

Tu dîwanên Hacî hene mamoste?

Çend şehirên Hacî Qadir di sala 1925an de li Bexdayê di bin  
navê "komela şehirên Hacî Qadirê Koyî" de çap kirin.

Hacî dîwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî dîtiye;  
bi destnivîseke hûr qederê 800 rûpel hebû. Hacî ji dîwana  
xwe di nisxe nivîsandi bûn; heke nisxeke wê tirkan şewitandiyê  
heye ko nisxa din rojekê bikeve destên min.

Gelo Hacî kengî wefat kiriye û li ku hatiye vesartin?

95

Le mecmûhî diwel, Soran û Botan

Le sayey em kitêbe nasirawe

Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî

Esasî nezmî kurdî danenawe.

Min bihîstiye te li gelek cihan pesnê Hacî daye, tu wî disibînî

Xanî. Tu dikarî vê hebekî şirove bikî?

Hacî qadirê Koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê  
rniletê xwe dişewitî. Şehir û qesîdeyên wî tev de li ser millet  
û welêt in.

Hacî Qadir ji ku ye mamoste?

Hacî Qadir kurê Mela Ehmed e, di gundê Gorqeraçê de ji  
diya xwe bûye, û ji eşîra Zengenê ye. Lê ji ber ko di zarotiya  
xwe de guhastiye Koyê navê "koyî" pê ve bûye.

Tu dîwanên Hacî hene mamoste?

Çend şehirên Hacî Qadir di sala 1925an de li Bexdayê di bin  
navê "komela şehirên Hacî Qadirê Koyî" de çap kirin.

Hacî dîwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî dîtiye;  
bi destnivîseke hûr qedere 800 rûpel hebû. Hacî ji dîwana  
xwe di nisxe nivîsandi bûn; heke nisxeke wê tirkan şewitandiyê  
heye ko nisxa din rojekê bikeve destên min.

Gelo Hacî kengî wefat kiriye û li ku hatiye vesartin?

95

Hacî di sala 19128 hicrî de li Stenbol çûye rehmetê. Bi eqlê  
min li Skûdarê di gornistana Reqece-Ehmed de veşartîye.

Ma te bi xwe Hacî Qadir nas dikir mamoste?

Ez dikarim bibêjim min Hacî dîtiye, lê ez nikarim bibêjim  
ez Hacî nas dikim. Ji ber ko sala ko Hacî çû rehmetê ez hêj  
nû keti bûm ser lingan.

Mamoste, mîna te berê anîbû zimên, zimanê kurdî ji sê  
zarên sereke tête pê. Te mînakên gelekî bas ji klasîkên

zaravayên kurmancî û soranî dan. Ez bawer dikim ew ê gelekî bi kêrî xwendevan û lêkolînerên me werin. Lê belê di derheqa zarê zazakî de agahdarîyên me kê in. Berî ku em behsa berhemên bi vî zarî bikin, ez dixwazim cenabê te bi kurtî be jî ji me re behsa vî zarî bike?. . . Zarê dumilî: Ev zar zimanê kurdên dumilî an zaza ne. Kurdên dumilî di welatê jorîn di rojavayê wî welatî de rûniştî ne. Bi piranî tevî kurdmancan in û ji zarê xwe pê ve bi kurdmancî jî dizanin. Li gora ko min seh kir di zarê dumilî de jî çend bir hene. Di bingehî de ev birên ha dido ne. Di nav van herdu biran de di danganê û qewaidê de ferqinî eşkere têne dîtin.

Yanî çawan?

Di denganiyê de: di zarê Sêwrekê de herfa "j" bi qasî kurd-96

Hacî di sala 19128 hicrî de li Stenbol çûye rehmêtê. Bi eqlê min li Skûdarê di gornistana Reqece-Ehmed de veşartîye.

Ma te bi xwe Hacî Qadir nas dikir mamoste?

Ez dikarim bibêjim min Hacî dîtiye, lê ez nikarim bibêjim ez Hacî nas dikim. Ji ber ko sala ko Hacî çû rehmêtê ez hêj nû keti bûm ser lingan.

Mamoste, mîna te berê anîbû zimên, zimanê kurdî ji sê zarên sereke tete pê. Te mînakên gelekî bas ji klasîkên zaravayên kurmancî û soranî dan. Ez bawer dikim ew ê gelekî bi kêrî xwendevan û lêkolînerên me werin. Lê belê di derheqa zarê zazakî de agahdarîyên me kê in. Berî ku em behsa berhemên bi vî zarî bikin, ez dixwazim cenabê

te bi kurtî be jî ji me re behsa vî zarî bike?. . . Zarê dumilî: Ev zar zimanê kurdên dumilî an zaza ne. Kurdên dumilî di welatê jorîn di rojavayê wî welatê de rûniştî ne. Bi piranî tevlî kurdmancan in û ji zarê xwe pê ve bi kurdmancî jî dizanin. Li gora ko min seh kir di zarê dumilî de jî çend bir hene. Di bingehê de ev birên ha dido ne. Di nav van herdu biran de di denganê û qewaidê de ferqinî eşkere têne dîtin.

Yanî çawan?

Di denganiyê de: di zarê Sêwrekê de herfa "j" bi qasî kurd-96

manciyê nîn be jî, di hin pirsan de têtê dîtin. Lê di dumiliyên din de mîna zarê Paloyê de "j" yekcar nîne û şûna wê "z"yek an "c"yek rabûye. Ji lewra ko ji dumiliyan re ji ber ko li şûna "j"ya kurdmancî "z" dibêjin "zaza" hate gotin.

Min di vî zarî de, di warê klasîkan de ji mewlûda Usman efendî pê ve tiştê nebihîstiyê. Lê îro bi zazakî gelek kitêb derketine û derdikevin. Tu ê bikaribî ji kerema xwe re hebekî behsa vê mewlûdê bikî?

Ji mêj ve min dil hebû hinekî bi zarê dumilî mijûl bibim. Nemaze mewlûda 'Usman Efendî bêxim dest. Wê bi yekî re ko rind bi dumiliya Sêwrekê dizane bixwînim, li ber binivîsînim û bidim çap kirin. Ji xwe di vî zarê şêrîn de ji û pê ve tiştê din nehatiye nivîsandin. Hatibe jî min nedîtiye, ne jî bihîstiyê.

Te got bidim çapkirin. Ma qey mewlûda Usman efendî nehatibû çapkirin?

Piştî Meşrûtiyê pismamekî min, Faîz Beg Bedir-Xan, bûbû

qaymeqamê Puturgê. Bavê Mela Nezîr Hecî îbrahîm çûbû balê. Mewlûd şanî wî da. Pir neajot Faîz Beg hate ezil kirin û vegeriya Stenbulê. Mewlûd jî bi xwe re bir ko bêxe çapê. Lê li Stenbulê jî ew nikaribûn bixwînin. Hingê Faîz Beg ji Hecî îbrahîm re nivîsandibû ko an ew bi xwe an kurê wî xwe bigihînin Stenbulê mewlûdê ji wan re bixwînin da ko bikarin çap bikin. Lê ne kur ne bav neçûn Stenbulê û mewlûd neket 97

manciyê nîn be jî, di hin pirsan de tête dîtin. Lê di dumiliyên din de mîna zarê Paloyê de "j" yekcar nîne û şûna wê "z"yek an "c"yek rabûye. Ji lewra ko ji dumiliyan re ji ber ko li şûna "j"ya kurdmancî "z" dibêjin "zaza" hate gotin. Min di vî zarî de, di warê klasîkan de ji mewlûda Usman efendî pê ve tiştêk nebihîstiyê. Lê îro bi zazakî gelek kitêb derketine û derdikevin. Tu ê bikaribî ji kerema xwe re hebekî behsa vê mewlûdê bikî?

Ji mêj ve min dil hebû hinekî bi zarê dumilî mijûl bibim. Nemaze mewlûda 'Usman Efendî bêxim dest. Wê bi yekî re ko rind bi dumiliya Sêwrekê dizane bixwînim, li ber binivîstînim û bidim çap kirin. Ji xwe di vî zarê şêrîn de ji û pê ve tiştêkî din nehatiye nivîsandin. Hatibe jî min nedîtiye, ne jî bihîstiyê.

Te got bidim çapkirin. Ma qey mewlûda Usman efendî nehatibû çapkirin?

Piştî Meşrûtiyetê pismamekî min, Faîz Beg Bedir-Xan, bûbû qaymeqamê Puturgê. Bavê Mela Nezîr Hecî îbrahîm çûbû balê. Mewlûd şanî wî da. Pir neajot Faîz Beg hate ezil kirin û vegeriya Stenbulê. Mewlûd jî bi xwe re bir ko bêxe çapê. Lê

li Stenbulê jî ew nikaribûn bixwînin. Hingê Faîz Beg ji Hecî  
îbrahîm re nivîsandibû ko an ew bi xwe an kurê wî xwe bigihînin  
Stenbulê mewlûdê ji wan re bixwînin da ko bikarin  
çap bikin. Lê ne kur ne bav neçûn Stenbulê û mewlûd neket  
97

çapê û Xwedê ji 'Usman Efendî re hez nekir ko keda xwe bi  
herfên reş bibînit.

Bi rastî jî tiştekî ne xwes e, ku mirov berhema keda xwe  
bi çavên xwe nebîne. Lê Xwedê ji we razî be, hûn li berhemên  
keda evqas însan xwedî derketine. Gelo ji bo şakirina  
giyanê Usman efendî wê cenabê te bikaribe mînakekê  
ji mewlûda wî bide?

Em vê çapê ji bona şakirina giyanê wî pêşkêşî wî dikin.

Bi namê wahîrê no ard û azmîn

Ke ma dest kerd bi no girwe rengîn

Şima hemdê xwe Ellayê rê biyarîn

Şew û roj qapîdê ey di biqarîn

Pêxemberî rê selewatî biwanîn

Tim û tim derdê cê ver di binalîn

Misalê na dinê zanî ti merdim

Ti citêrênî, girwey to jî toxim

Ke to zanan kî no dinya senîn o

Bizanê a dinê cayê cû nîyo

Wedaro ey çe kî citêr bikaro

Kî citêr çî karit ey wedaro

Beso tobe biyarîn hey xedarîn

Dinyay di to hemî hewl bikarîn

Gunahdê xo rê arê bin binalîn



Birejnîn hersê çiman ra bikalîn  
Bibo 'efêw gunahê mayê vêrdo

99

çapê û Xwedê ji 'Usman Efendî re hez nekir ko keda xwe bi  
herfên reş bibînit.

Bi rastî jî tiştê ne xwes e, ku mirov berhema keda xwe  
bi çavên xwe nebîne. Lê Xwedê ji we razî be, hûn li berhemên  
keda evqas însan xwedî derketine. Gelo ji bo şakirina  
giyanê Usman efendî wê cenabê te bikaribe mînakekê  
ji mewlûda wî bide?

Em vê çapê ji bona şakirina giyanê wî pêşkêşî wî dikin.

Bi namê wahîrê no ard û azmîn  
Ke ma dest kerd bi no girwe rengîn  
Şima hemdê xwe Ellayê rê biyarîn  
Şew û roj qapîdê ey di biqarîn  
Pêxemberî rê selewatî biwanîn  
Tim û tim derdê cê ver di binalîn  
Misalê na dinê zanî ti merdim  
Ti citêrênî, girwey to jî toxim  
Ke to zanan kî no dinya senîn o  
Bizanê a dinê cayê cû nîyo  
Wedaro ey çe kî citêr bikaro  
Kî citêr çî karit ey wedaro  
Beso tobe biyarîn hey xedarîn  
Dinyay di to hemî hewl bikarîn  
Gunahdê xo rê arê bin binalîn  
Birejnîn hersê çiman ra bikalîn  
Bibo 'efêw gunahê mayê vêrdo

Gunehkarî kî 'umrê xo di kerdo

Selewatî biwanîn rind û bolî

Biresnîn pê dima gandê resûlî

FIRAT CEWERÎ: Gava mirov li dîrokê dinêre, mirov dibîne ku bi qasî şaîr û edîban mêrxas û siyasetvanên kurdan jî hebûne. Yek ji van Selaheddînê Eyyûbî ye. Geio bi rastî Selaheddînê Eyyûbî kurd bû?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Herê Selaheddîn kurd bû, ji me bû, ji mezinên kurdan bû, hêj bêtir û rastir kurdê mezin û mirovê mezin bû.

Kurdê mezin çi ye?

Ji xwe mezinahî bi mezinan çêdibe. Ko mezin nînbin mezinahî naye pê, mezinahiya miletan jî holê ye. Milet bi mirovên mezin û bijarte mezin in. Ew milet mezin e ko mezinan ditêne pê, mirovên mezin jê derdikevin.

Ma miletê kurd heta niha tu mirovên mezin derxistine?

Ji miletê kurdan gelek mirovên mezin derketine. Herwekî ioo

Gunehkarî kî 'umrê xo di kerdo

Selewatî biwanîn rind û bolî

Biresnîn pê dima gandê resûlî

FIRAT CEWERÎ: Gava mirov li dîrokê dinêre, mirov dibîne ku bi qasî şaîr û edîban mêrxas û siyasetvanên kurdan jî hebûne. Yek ji van Selaheddînê Eyyûbî ye. Geio bi rastî Selaheddînê Eyyûbî kurd bû?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Herê Selaheddîn kurd bû, ji me bû, ji mezinên kurdan bû, hêj bêtir û rastir kurdê mezin û

mirovê mezin bû.

Kurdê mezin çi ye?

Ji xwe mezinahî bi mezinan çêdibe. Ko mezin nînbin mezinahî naye pê, mezinahiya miletan jî holê ye. Milet bi mirovên mezin û bijarte mezin in. Ew milet mezin e ko mezinan ditêne pê, mirovên mezin jê derdikevin.

Ma miletê kurd heta niha tu mirovên mezin derxistine?

Ji miletê kurdan gelek mirovên mezin derketine. Herwekî ioo

Şarmoy - zanakî rûs - gotiye. Ez ê çend pirsên Şarmoyî bi kurtî, biguhêzime hir: "O miletin hene bi cengawerî û dîlaweriya hin serdarên xwe, xwe dane naskirin û ji hin dewletên Asya û Afrîqayê padişahin dane. Kurd ji wan in. Navê kurdan hêj di pêşiya zemanê kevn de bi derbên Rostem û pêşdetir bi kîşwerkêsayiyên Selaheddîn û birayê wî Melîk el-'Adil, bilind û geş bûye. Ji van pê ve ev miletê ha mezinên din jî gihandine. Herwekî Kerîm Xanê Zendî ko di nivê babilîska hevdehem de malbata Zendî daniye, û zanayê mezin îbn el-Esîriyê Cizîrî û Ebû el-Feda, ji mîrekên Eyyûbî, û dî-roknivîsê zirav îdrîsê Bidlîsî. . ."

Min di cihekî de xwendibû ku ji Selaheddînê Eyyûbî re "Muhemmedê duwem" digot. Gelo ji ber çi jê re weha tete gotin?

Miletê kurdan Selaheddîn di heyameke welê de anîbû dinyayê ko dinya bûbû du ber û li hev ketibû. Di deşt û bilincihên Ewropayê de bi hezar, bi lek û kirûran xelk gihabûn hev û berên xwe dabûn welatê rojhilat.

Miletên îsa dirêjî miletê Muhemmed kiribûn. Bi salan ve

pevçûn, lehiyên xwînê herikîn, bi hezaran mirov hatine kuştin. Miletên îsa milletên Muhemmed çê kirin. Hindik ma bû ola Muhemmed ji navê hilaniyana. Ji du olên dinyayê ên mezin yek noq bûwa, a din ew daxwarina. Bi kurtî ola Muhemmed diçû winda dibû. Êdin xelkê baweriya xwe pê ne aniyana.

Hingê ji welatê Serhedan, ji çiyayên Kurdistanê, ji serên zi-  
101

Şarmoy - zanakî rûs - gotiye. Ez ê çend pirsên Şarmoyî bi kurtî, biguhêzime hir: "O milletin hene bi cengawerî û dîlaweriya hin serdarên xwe, xwe dane naskirin û ji hin dewletên Asya û Afrîqayê padişahin dane. Kurd ji wan in. Navê kurdan hêj di pêşiya zamanê kevn de bi derbên Rostem û pêşdetir bi kîşwerkêsayiyên Selaheddîn û birayê wî Melîk el-'Adil, bilind û geş bûye. Ji van pê ve ev milletê ha mezinên din jî gihandine. Herwekî Kerîm Xanê Zendî ko di nivê babilîska hevdehem de malbata Zendî daniye, û zanayê mezin îbn el-Esîriyê Cizîrî û Ebû el-Feda, ji mîrekên Eyyûbî, û dî-roknivîsê zirav îdrîsê Bidlîsî. . ."

Min di cihekî de xwendibû ku ji Selaheddînê Eyyûbî re "Muhemmedê duwem" digot. Gelo ji ber çî jê re weha tête gotin?

Miletê kurdan Selaheddîn di heyameke welê de anîbû dinyayê ko دنیا bûbû du ber û li hev ketibû. Di deşt û bilincihên Ewropayê de bi hezar, bi lek û kirûran xelk gihabûn hev û berên xwe dabûn welatê rojhilat.

Miletên îsa dirêjî milletê Muhemmed kiribûn. Bi salan ve pevçûn, lehiyên xwînê herikîn, bi hezaran mirov hatine kuştin.

tin. Miletên îsa milletên Muhemmed çê kirin. Hindik ma bû ola Muhemmed ji navê hilaniyana. Ji du olên dinyayê ên mezin yek noq bûwa, a din ew daxwarina. Bi kurtî ola Muhemmed diçû winda dibû. Êdin xelkê baweriya xwe pê ne aniyana.

Hingê ji welatê Serhedan, ji çiyayên Kurdistanê, ji serên zi-  
101

narên me rojek hilat. Selaheddîn. . . Miletên îsa çê kirin. Ola Muhemmed parast, xelas kir û ji

nû ve danî, ji lewra jê re Muhemmedê duwem jî tete gotin.

Gelo ev kurdê mêrxas, zana û alim ji kîjan devera Kurdistanê ye; kî ye, ji çi malbat û eşîrê ye, li ku, çi xwendiyê?

Selaheddîn ji welatê Serhedan ji kurdên Rawendî ye. Bapîrê

wî digel du kurên xwe Şadî Necmeddîn Eyyûb û Esed edDîn

Şêrkoh, ji welatê xwe guhastibû Bexdayê û jê çûbû Tikrîtê.

Li wê cih bûbû. Bapîrê Selaheddîn di Tikrîtê de çûye

rehmetê, pêşdetir birayê mezin, Necmeddîn Eyyûbî ko bavê

Selaheddîn e, bû dezdarê Tikrîtê. Di sala (1137/532) di Tikrî-

tê de Selaheddîn hatibû dinyayê. Paş du salan hakimê Mûsilê

Emadeddînê Zengî ji Tikrîtê derbas dibû. Necmeddîn di

hin tiştan de arîkariya wî kiribû. Emadeddîn, Necmeddîn û

mirovên xwe bi xwe re birin. O piştî vekirina keleha be'lebekê

ew kir derzdarê wê.

Selaheddînê zaro jî bi bavê xwe ve guhastibû Sûriyê.

Xwendina wî a pêşîn di Be'lebekê de ye. Pêşdetir li Şamê ber

destên melayên mezin de xwendî ye. Li Şamê di dîwana Nû-

reddîn de bi xwedî dibû.

Têkiliyên Selaheddîn bi apê wî re gelekî bas bû. Heta

apê wî wî bi xwe re dibe Misrê. Selaheddîn demekê dibe  
melikê Misrê. Gelo ev pêvajo çawan çêbû?

102

narên me rojek hilat. Selaheddîn. . . Miletên îsa çê kirin. Ola  
Muhemmed parast, xelas kir û ji

nû ve danî, ji lewra jê re Muhemmedê duwem jî têtê gotin.

Gelo ev kurdê mêrxas, zana û alim ji kîjan devera Kurdistanê  
ye; kî ye, ji çi malbat û eşîrê ye, li ku, çi xwendiyê?

Selaheddîn ji welatê Serhedan ji kurdên Rawendî ye. Bapîrê

wî digel du kurên xwe Şadî Necmeddîn Eyyûb û Esed edDîn

Şêrkoh, ji welatê xwe guhastibû Bexdayê û jê çûbû Tikrîtê.

Li wê cih bûbû. Bapîrê Selaheddîn di Tikrîtê de çûye

rehmetê, pêşdetir birayê mezin, Necmeddîn Eyyûbî ko bavê

Selaheddîn e, bû dezdarê Tikrîtê. Di sala (1137/532) di Tikrî-

tê de Selaheddîn hatibû dinyayê. Paş du salan hakimê Mûsilê

Emadeddînê Zengî ji Tikrîtê derbas dibû. Necmeddîn di

hin tiştan de arîkariya wî kiribû. Emadeddîn, Necmeddîn û

mirovên xwe bi xwe re birin. O piştî vekirina keleha be'lebekê  
ew kir derzdarê wê.

Selaheddînê zaro jî bi bavê xwe ve guhastibû Sûriyê.

Xwendina wî a pêşîn di Be'lebekê de ye. Pêşdetir li Şamê ber

destên melayên mezin de xwendî ye. Li Şamê di dîwana Nû-

reddîn de bi xwedî dibû.

Têkiliyên Selaheddîn bi apê wî re gelekî bas bû. Heta

apê wî wî bi xwe re dibe Misrê. Selaheddîn demekê dibe  
melikê Misrê. Gelo ev pêvajo çawan çêbû?

102

io}

Di sala (558/1162) de Esed ed-Dîn Şêrkoh diçû hawara Misriyan. Biraziyê wî Selaheddîn jî pê re çû. Esed ed-Dîn du carên din jî çûbû Misrêl Di herdu caran de biraziyê wî pê re bû. Di cara siyem de li wê cih bûn û li Misrê man. Sal pênce û jêst û çar bû. Hingê 'Adid ed-Dînîllah, xelîfeyê Fatimiyan ê pajîn li ser kevilê xîlafetê rûdinijt. 'Adid ed-Dîn, Şêrkoh xistibû şûna Şawer û kiribû wezîrê xwe. Selaheddînê xort jî ber destê mamê xwe dixebitî. Pijî salekê Şêrkoh çû rehmetê û Selaheddîn kete dewsa wî û bû wezîrê 'Adid ed-Dîn.

Di sala (567/1171) de bi mirina 'Adid ed-Dîn Selaheddîn bû melîkê Misrê. Herçendî Selaheddîn bin destê Nûreddîn dihate hesêb jî di rastiyê de bi serê xwe bû. Paj du salan Nûreddîn jî bê zar û zêç çû rehmetê û welatê Sûriyê jî bi tevayî ket bin destê Selaheddîn.

Tê zanîn ku erdeke fireh di bin hukumdariya Selaheddîn de bû. Gelo tu zanebûneke te ya eseh di vê derheqê de heye?

Dewleta Selaheddîn ji Kurdistanê diçû heta welatê Tunîsê. Selaheddîn bîst û du salan hukum kir.

Selaheddîn kengî û li ku çû rehmetê?

Di sala (589/1193) de li Şamê çû rehmetê.

Emrê wî gihîştibû çend salan mamoste?

104

Di sala (558/1162) de Esed ed-Dîn Şêrkoh diçû hawara Misriyan. Biraziyê wî Selaheddîn jî pê re çû. Esed ed-Dîn du carên din jî çûbû Misrêl Di herdu caran de biraziyê wî pê re bû. Di cara siyem de li wê cih bûn û li Misrê man. Sal pênce û jêst û çar bû. Hingê 'Adid ed-Dînîllah, xelîfeyê Fatimiyan

ê pajîn li ser kevilê xîlafetê rûdiniyt. 'Adid ed-Dîn, Şêrkoh xistibû şûna Şawer û kiribû wezîrê xwe. Selaheddînê xort jî ber destê mamê xwe dixebitî. Pijî salekê Şêrkoh çû rehmetê û Selaheddîn kete dewsa wî û bû wezîrê 'Adid ed-Dîn. Di sala (567/1171) de bi mirina 'Adid ed-Dîn Selaheddîn bû melîkê Misrê. Herçendî Selaheddîn bin destê Nûreddîn dihate hesêb jî di rastiye de bi serê xwe bû. Paj du salan Nûreddîn jî bê zar û zêç çû rehmetê û welatê Sûriyê jî bi tevayî ket bin destê Selaheddîn.

Tê zanîn ku erdeke fireh di bin hukumdariya Selaheddîn de bû. Gelo tu zanebûneke te ya eseh di vê derheqê de heye?

Dewleta Selaheddîn ji Kurdistanê diçû heta welatê Tunîsê.

Selaheddîn bîst û du salan hukum kir.

Selaheddîn kengî û li ku çû rehmetê?

Di sala (589/1193) de li Şamê çû rehmetê.

Emrê wî gihîştibû çend salan mamoste?

104

Emrê wî gihîjtibû pêncî û heftan.

Ew li Kurdistanê vesartiye an li devereke din?

Li Şamê di nêzîngî mizgefta Emewî de vejartî ye.

Tistê ku ez dizanim Selaheddîn ne mîna qiral û silatanên din bû; ew siltan û hukumdarekî mervan bû, dilbirehim bû, ne xedar û bêwijdan bû. Herweha wî standarta jiyana welatên xwe jî bilind digirt. Ma ne welê mamoste?

Selaheddîn di vî zemanê kin de welatên dewleta xwe hemî jî ava kiribûn. Avahîke welê ko xelkên Ewropayê ji wan nimûne digirtin.



Ger tu bi kurtî Selaheddîn tarîf bikî, tu ê wî çawan tarîf bikî?

Selaheddîn sultan bû, serdar bû, zana û şair bû. Ser hertijtên dinyayê serwext bû. Tebabet jî dizanî bû.

Te ev got hat bîra min. Dibêjin serpêhatiyeye wî bi Rîjarê diîşêr re heye. Lê baş nayê bîra min. Gelo tijtekî welê di bîra cenabê te de maye?

Dibêjin ko berberê wî qeranê îngilîstanê Rîjarê diljêr di wextê jerî de nexwej ketibû. Halê wî xedar bû. Bijîjkên Qiran nikarîbûn Qiranê xwe derman bikin. Selaheddîn bijîj-  
105

Emrê wî gihîjtibû pêncî û heftan.

Ew li Kurdistanê vesartiye an li devereke din?

Li Şamê di nêzîngî mizgefta Emewî de vejartî ye.

Tistê ku ez dizanim Selaheddîn ne mîna qiral û silatanên din bû; ew siltan û hukumdarekî mervan bû, dilbirehim bû, ne xedar û bêwijdan bû. Herweha wî standarta jiyana welatên xwe jî bilind digirt. Ma ne welê mamoste?

Selaheddîn di vî zemanê kin de welatên dewleta xwe hemî jî ava kiribûn. Avahîke welê ko xelkên Ewropayê ji wan nimû-  
ne digirtin.

Ger tu bi kurtî Selaheddîn tarîf bikî, tu ê wî çawan tarîf bikî?

Selaheddîn sultan bû, serdar bû, zana û şair bû. Ser hertijtên dinyayê serwext bû. Tebabet jî dizanî bû.

Te ev got hat bîra min. Dibêjin serpêhatiyeye wî bi Rîjarê diîşêr re heye. Lê baş nayê bîra min. Gelo tijtekî welê di bîra cenabê te de maye?

Dibêjin ko berberê wî qeranê îngilîstanê Rîjarê diljêr di wextê jerî de nexwej ketibû. Halê wî xedar bû. Bijîjkên Qiran nikarîbûn Qiranê xwe derman bikin. Selaheddîn bijîj-

105

kên xwe jandibûn balê. Ew jî bi ser nexweşiya Rîjar venebûn. Hingê Selaheddîn bi xwe, ket jeklê bijîjkan, çû nik Rîjar û dijminê xwe derman kir.

Bi rasti hejmara mirovên welê li dinyayê gelekî kêm e. Jixwe di gelek çavkaniyan de jî bi pesin qala Selaheddînê Eyyûbî dikin. Lê nizanim, gelo mirov dikare wî kurd bihesibîne û ji ber serbilind be?

Selaheddîn ji wan mezinan bû ko qedrê wî ne tenê mirov, dost, millet û bin destên wî lê dijmin û neyarên wî jî dizanîbûn û heta îro jî dizanin.

Di sala (1898/1316) de wekî împeratorê Almanan hatibû Şamê qesda tirba Selaheddîn kiribû. Berî ko bigihe tîrbê ji gergeroka xwe peya bû û pêleke dirêj bi peyatî çûbû. Her ev Selaheddîn, mirov û serdarê mezin Selaheddînê me bû.

Selaheddîn

kurd bû. Ji bona mezinahiya miletekî ma Selaheddînek ne bes e?

FIRAT CEWERÎ: Ji bo mezinahiya miletekî Selaheddînek bes e, lê ji bo hisyarkirin û zanekirina miletekî şîret û pendên mezinan lazim e. Te ji çîrokên Yewnanîstana kevin hin pend û sîretên qenc li ser hisyarkirina miyetan wergerandiye kurdî. Bi taybetî jî ew pîrsên li ser zimên û girîngiya zimên mirov dibêje qey ew li ser kurdan û ji bo kurdan hatine gotin.

106

kên xwe jandibûn balê. Ew jî bi ser nexweşiya Rîjar venebûn.

Hingê Selaheddîn bi xwe, ket jeklê bijîjkan, çû nik Rî-

jar û dijminê xwe derman kir.

Bi rasti hejmara mirovên welê li dinyayê gelekî kêm e.

Jixwe di gelek çavkaniyan de jî bi pesin qala Selaheddînê

Eyyûbî dikin. Lê nizamim, gelo mirov dikare wî kurd bihesibîne

û ji ber serbilind be?

Selaheddîn ji wan mezinan bû ko qedrê wî ne tenê mirov,

dost, millet û bin destên wî lê dijmin û neyarên wî jî dizanî-

bûn û heta îro jî dizanin.

Di sala (1898/1316) de wekî împeratorê Almanan hatibû

Şamê qesda tirba Selaheddîn kiribû. Berî ko bigihe tîrbê ji

gergeroka xwe peya bû û pêleke dirêj bi peyatî çûbû. Her ev

Selaheddîn, mirov û serdarê mezin Selaheddînê me bû.

Selaheddîn

kurd bû. Ji bona mezinahiya miletekî ma Selaheddî-

nek ne bes e?

FIRAT CEWERÎ: Ji bo mezinahiya miletekî Selaheddînek bes

e, lê ji bo hisyarkirin û zanekirina miletekî şîret û pendên

mezinan lazim e. Te ji çîrokên Yewnanîstana kevin

hin pend û sîretên qenc li ser hisyarkirina miyetan wergerandiye

kurdî. Bi taybetî jî ew pirsên li ser zimên û girîngiya

zimên mirov dibêje qey ew li ser kurdan û ji bo kurdan

hatine gotin.

106

Gelo tu ji wan şîret û pendan têne bîra te, mamoste?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Li wextê berê miletek hebû,

miletekî mêr û ciwanmêr, lê nezan. Ew millet keti bûn bin destên milletine din. Milletên serdest zilm û stemkarî lê dikirin. Milletê bindest ji heyîna xwe bêxeber, di bin nîrê milletên serdest de hero belengaztir dibû. Lê milletê ji her tijtî bê hay, bi belengaziya xwe jî ne dihesiya.

Çawan? Yanî wan nizanîbûn ku ew bindest in? Ma kesî ku ew şiyar bikirana tune bûn?

Rojekê, pîrek ji nav wî milletê bindest rabû. Pîr li halê milletê xwe temaşe kir; li ser nexwejiya wî vebû.

Nexwejiya wî çi bû mamoste? Mebêje ku ew jî mîna kurdan bêî ziman û alfabeyeke yekgirtî bûn?

Rabû elfabeyek çêkir û millet da xwendin. Wî pîrî li xelkê xwe pend û jîret dikirin û digot: "Zarona, li zimanê xwe miqate bin, pihêt pê bigirin, hînî xwendin û nivîsandinê bibin; qedrê zimanê xwe bizanin. Miletekî dîl yê ko zimanê xwe winda nekiriye dimîne wî hepsiyê ko mifta zîndana wî di destê wî de ye. Belê, zimanê we heyîna we ye. Hon bi tenê bi zimanê xwe ji milletine din tene ferq kirin. O rojekê hon ê bi xêra wî ji hêsîriyê xelas bibin".

Gelo millet bi a wî kalî kir?

107

Gelo tu ji wan şîret û pendan tene bîra te, mamoste?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Li wextê berê miletek hebû, miletekî mêr û ciwanmêr, lê nezan. Ew millet keti bûn bin destên milletine din. Milletên serdest zilm û stemkarî lê dikirin. Milletê bindest ji heyîna xwe bêxeber, di bin nîrê milletên serdest de hero belengaztir dibû. Lê milletê ji her tijtî bê hay, bi belengaziya xwe jî ne dihesiya.

Çawan? Yanî wan nizanîbûn ku ew bindest in? Ma kesî ku ew şiyar bikirana tune bûn?

Rojekê, pîrek ji nav wî milletê bindest rabû. Pîr li halê milletê xwe temaşe kir; li ser nexwejiya wî vebû.

Nexwejiya wî çi bû mamoste? Mebêje ku ew jî mîna kurdan bêziman û alfabeke yekgirtî bûn?

Rabû elfabekek çêkir û millet da xwendin. Wî pîr li xelkê xwe pend û jîret dikirin û digot: "Zarona, li zimanê xwe miqate bin, pihê pê bigirin, hînî xwendin û nivîsandinê bibin; qedrê zimanê xwe bizanin. Miletêkî dîl yê ko zimanê xwe wînda nekiriye dimîne wî hepsiye ko mifta zîndana wî di destê wî de ye. Belê, zimanê we heyîna we ye. Hon bi tenê bi zimanê xwe ji milletine din tene ferq kirin. O rojekê hon ê bi xêra wî ji hêsîriyê xelas bibin".

Gelo millet bi a wî kalî kir?

107

Millet ji ya pîr kir, hînî xwendin û nivîsandinê bû. Xêra zanî-nê li her tijtên dinyayê hijyar bû; bi heyîna xwe hesiya.

Yanî tu dîbêjî rola zanî-nê mezin e. . . Belê, millet zanî ko heta hingê di zîndana nezaniyê a tarî de

pûyan dibû. Çira zanî-nê dora millet bi ronî kir. Millet her tijt dît.

Zorkeran di tariyê de li wî dixistin, millet çu nedidît. Lê gava zanî-nê hawîr bi ronî kir, millet çoyê zilmê di ser xwe re dît, ew girt û ew jkêrand; berê xwe da deriyê zîndanê û jê derket. Ji ber ko, herwekî pîr goti bû, mifte pê re bû.

Tistê ku ez ji van pend û sîretan derdixim ew e ku divê mirov hînî zimanê xwe bibe, ziman e ku endamên milletêkî

bi hev re dike yek û ew yekîtî ye ku miletan ji zîndana  
ziimê azad dikin. Ji miletê ku guh nadin zimanê xwe  
re tu dikarî çi bibêjî?

Weyl ji wî miletî re ko zimanê xwe winda kiriye.

FIRAT CEWERÎ: Ez dixwazim dîsan vegerim ser pîrsa destpê-  
kê; te behsa zanîn û xwenasînê kiribû. Min divê ji cenabê  
108

Milet ji ya pîr kir, hînî xwendin û nivîsandinê bû. Xêra zanî-  
nê li her tijtên dinyayê hijyar bû; bi heyîna xwe hesiya.

Yanî tu dîbêjî rola zanînê mezin e. . . Belê, milet zanî ko heta hingê  
di zîndana nezaniyê a tarî de  
pûyan dibû. Çira zanînê dora milet bi ronî kir. Milet her tijt  
dîtin.

Zorkeran di tariyê de li wî dixistin, milet ço nedidît. Lê gava  
zanînê hawîr bi ronî kir, milet çoyê zilmê di ser xwe re  
dît, ew girt û ew jkênand; berê xwe da deriyê zîndanê û jê  
derket. Ji ber ko, herwekî pîr goti bû, mifte pê re bû.

Tistê ku ez ji van pend û sîretan derdixim ew e ku divê  
mirov hînî zimanê xwe bibe, ziman e ku endamên miletekî  
bi hev re dike yek û ew yekîtî ye ku miletan ji zîndana  
ziimê azad dikin. Ji miletê ku guh nadin zimanê xwe  
re tu dikarî çi bibêjî?

Weyl ji wî miletî re ko zimanê xwe winda kiriye.

FIRAT CEWERÎ: Ez dixwazim dîsan vegerim ser pîrsa destpê-  
kê; te behsa zanîn û xwenasînê kiribû. Min divê ji cenabê  
108

~°9

te vê jî bipirsim. Te nivîsek bi navê "Xwe binas..." nivî-

sandiye, min ew nivîs bi kêfxwesî xwend. Gelo armanca te bi wê nivîsê an jî bi wê sernavê çi ye?

MÎRCELADETALÎBEDIR-XAN: Heyina te, heyina miletê te, tenê bi hatin nasînê tête pê. Hetanî ko tu meyî naskirin, xwe medî nasîn, di nav koma miletan de cihê te nînc. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin.

Yanî çawan?...

Tu kî yî? Ji kîjan milet û nîjadî yî? Zimanê te çi ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di çi halî de yî? Jê çawan dikarî bifilitî? Wê çaxê cenabê te pêsniyaz dike ku ez vê benda ha careke din bixwînim û bi alîkariya wê xwe û miletê xwe nas bikim. Ne wilo?

Qenc bixwîne, rind bala xwe bide, hin berên wê jiber bike. Paş ko te ev xwend û seh kir, nas û hevalên xwe re bide xwendin û ji nexwendiyar re bi xwe bixwîne û bide zanîn. Ger ez bi a te bikim, ez li şîret û gotinên te guhdarî bikim ma tu ê kêfxwes bibî?

Heke te holê kir, bi gotin û pendên min ve çûyî, tu xortê min î, xortê miletê xwe yî, sezayê jabaj û pesn î. An ne. . . ji xwe destên min ji te dibin. no

te vê jî bipirsim. Te nivîsek bi navê "Xwe binas..." nivîsandiye, min ew nivîs bi kêfxwesî xwend. Gelo armanca te bi wê nivîsê an jî bi wê sernavê çi ye?

MÎRCELADETALÎBEDIR-XAN: Heyina te, heyina miletê te, tenê bi hatin nasînê tête pê. Hetanî ko tu meyî naskirin, xwe medî nasîn, di nav koma miletan de cihê te nînc. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin.

Yanî çawan?...

Tu kî yî? Ji kîjan millet û nîjadî yî? Zimanê te çi ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di çi halî de yî? Jê çawan dikarî bifilitî? Wê çaxê cenabê te pêsniyaz dike ku ez vê benda ha careke din bixwînim û bi alîkariya wê xwe û milletê xwe nas bikim. Ne wilo?

Qenc bixwîne, rind bala xwe bide, hin berên wê jiber bike. Paş ko te ev xwend û seh kir, nas û hevalên xwe re bide xwendin û ji nexwendiyar re bi xwe bixwîne û bide zanîn. Ger ez bi a te bikim, ez li şîret û gotinên te guhdarî bikim ma tu ê kêfxwes bibî?

Heke te holê kir, bi gotin û pendên min ve çûyî, tu xortê min î, xortê milletê xwe yî, sezayê jabaj û pesn î. An ne. . . ji xwe destên min ji te dibin. no

Mamoste, tu dikarî ji kerema xwe re hebekî min bi min bidî naskirin. Gelo ez kî me? Kurd kî ne?

Xorto! Tu çîlê miletekî kevn, nijadekî mezin î. Pêjyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne.

Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatîyê Ariyan î. . . Bi destûra te be ez di xwazim di vir de peyva te bibirim.

Tu evqas pesnê min û nijadê min didî. Ma tu nabînî bê em di çi rewşê de ne?

Lê îro ne tu yî, dîlê, reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û bindest î.

Tu bawer dikî ku ez ê di vê rê de bimesim? Ma ez ê newestim, wek hinekan xwe nedim alî?

Te sond xwariye, li ser bext û xencera xwe. Sibe tu yî aza serefraz, bextiyar, kamiran, serdest û bi serxwe bî. Te ev rê ji xwe re bijartiye û tê re diçî. Hêj gelek neçûyî. Tenê çend sale



in ko tu tê de yî. Carinan diçî, carinan disekinî jaj dibî,  
ecêbmayî dimînî, li dora xwe dinihêrî, xwe bi tenê dibînî, didî  
nependiyan.

Rast e, min sond xwariye, ez ê ji ser vê rê danegerim. Digel  
ku cenabê te jî anî zimên ez şaş dibim, xwe bi tenê dibînim,  
lê çima cenabê te jî alîkariya min nake?

iii

Mamoste, tu dikarî ji kerema xwe re hebekî min bi min  
bidî naskirin. Gelo ez kî me? Kurd kî ne?

Xorto! Tu çîlê miletekî kevn, nijadekî mezin î. Pêjyên te di  
rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne.

Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Ariyan î. . . Bi destûra te  
be ez di xwazim di vir de peyva te bibirim.

Tu evqas pesnê min û nijadê min didî. Ma tu nabînî bê  
em di çi rewşê de ne?

Lê îro ne tu yî, dîlê, reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û  
bindest î.

Tu bawer dikî ku ez ê di vê rê de bimesim? Ma ez ê newestim,  
wek hinekan xwe nedim alî?

Te sond xwariye, li ser bext û xencera xwe. Sibe tu yî aza serefraz,  
bextiyar, kamiran, serdest û bi serxwe bî. Te ev rê ji

xwe re bijartiye û tê re diçî. Hêj gelek neçûyî. Tenê çend sale  
in ko tu tê de yî. Carinan diçî, carinan disekinî jaj dibî,  
ecêbmayî dimînî, li dora xwe dinihêrî, xwe bi tenê dibînî, didî  
nependiyan.

Rast e, min sond xwariye, ez ê ji ser vê rê danegerim. Digel  
ku cenabê te jî anî zimên ez şaş dibim, xwe bi tenê dibînim,  
lê çima cenabê te jî alîkariya min nake?

iii

Ev pêlek e em tevde bi riya çiyakî asê ve diçin. Herçend em ji cihê xwe ê pêsin dûr dikevin hawîr, çarnikar fire dibin, ba tê de xurt e, pêjiya me pê da bandev û bahos e.

Belê rê, rêke asê, bi kevir, pêjiya me lat û ferjinin zinar, kop û gaz in. Lingên me de ne sol, ne pêlav dimînin. Carin hene, em kirasên xwe diçirînin û ji lingên xwe ên birîndar re pêrejkan çêdikin.

Bi destên me re çîmên hesinîn hene. Serên wan dikevin kuç û berên rê. Ew wan dialêsin, bi rêva û pê ew kurt dibin, em di ser wan re ditewihin, pijta me du ta dibit. Lê herçend çîmên me kin, pijtên me du ta dibin rêya me jî ew çend kurt dibit.

Ji kerema xwe re hebekî din jî veke, min bas fêhm nekir...

Rojin hene li me tarî ye, roja me girtiye. Lê em bi ruhnahiya dilên xwe hawîrdora xwe dibînin.

Ev gotina "bi ruhnahiya dilên xwe hawîrdora xwe dibîrûn" bi min pir xwes hat mamoste. Gelo wê mamoste ji bo sevan çi bibêje?

Şevin hene xew li me diçit, lê em di hijyarî û di ramana armanca xwe de canên xwe divesihînin.

Yanî bi rastî jî tistek ji vî karê ku em dikin dikeve serê cenabê te? Tu bawer dikî wê tistek jê derkeve?

112

Ev pêlek e em tevde bi riya çiyakî asê ve diçin. Herçend em ji cihê xwe ê pêsin dûr dikevin hawîr, çarnikar fire dibin, ba tê de xurt e, pêjiya me pê da bandev û bahos e.

Belê rê, rêke asê, bi kevir, pêjiya me lat û ferjinin zinar,

kop û gaz in. Lingên me de ne sol, ne pêlav dimînin. Carin hene, em kirasên xwe diçirînin û ji lingên xwe ên birîndar re pêrejkan çêdikin.

Bi destên me re çîmên hesinîn hene. Serên wan dikevin kuç û berên rê. Ew wan dialêsin, bi rêva û pê ew kurt dibin, em di ser wan re ditewihin, pijta me du ta dibit. Lê herçend çîmên me kin, pijtên me du ta dibin rêya me jî ew çend kurt dibit.

Ji kerema xwe re hebekî din jî veke, min bas fêhm nekir...

Rojin hene li me tarî ye, roja me girtiye. Lê em bi ruhnahiya dilên xwe hawîrdora xwe dibînin.

Ev gotina "bi ruhnahiya dilên xwe hawîrdora xwe dibîrûn" bi min pir xwes hat mamoste. Gelo wê mamoste ji bo sevan çi bibêje?

Şevin hene xew li me diçit, lê em di hijyarî û di ramana armanca xwe de canên xwe divesihînin.

Yanî bi rastî jî tistek ji vî karê ku em dikin dikeve serê cenabê te? Tu bawer dikî wê tistek jê derkeve?

112

Xorto! Te ji dîroka milletê xwe, karek li ser xwe girtiye. Ew barekî giran e. Ji xwe barên giran para mêran, para mêran barê giran in. Te ew li pijta xwe kiriye û daye kaja çiyayên ko bi rê ve bilindtir û asêtir dibin.

Rica dikim mamoste. Ez bawer dikim bi tenê ji bo ku tu dilê min xwes bikî tu vê dibêjî. Lê ez dixwazim cenabê te pê bizanibe ku ev barê giran min ji ber bîrbirî û dûrbîniya te hilgirtiye. Ger min berxwedana te nedîtiba, ez bi zanebûna te nehesyama û ez bi şîretên te perwerde nebû-

ma, bawer bike mamoste, min ê nikarîba bi barekî giran  
bi çiyê ve rapelikiyama. O niha jî gava ez bi çiyê ve hildikijim  
ez diwestim. . . Herçend hildikijî û ji dejtê dûr dikevî, diwestî, lê ew  
çend

zexm û xurt dibî. Hawîr diguhire, tijtinin welê dibînî ko bi  
te nenas in. Ji dûr ve leylanan de, dinyake nû, ji bo te nû bi  
xwe kevn lê jibîrkirî, dibînî.

Gelo ew çi dinya ye? Ma ji bo wê derê hêja ye ku mirov  
evqas cefayê bikisîne?

Ew der gulîstan, gulgejtek e. Tê de avên zelal diherikin,  
mêrgên rengereng wek keskesorên ezmanî diçirisin. Darên  
wê tev kesk û bijkivîne, xelkê wê delal, ciwan û xurt, herçî  
mêr zava herçî jin hêj nû bûk in. Ew dinya tu bi xwe yî, ew  
kurdanîye.

"3

Xorto! Te ji dîroka milletê xwe, karek li ser xwe girtiye. Ew  
barekî giran e. Ji xwe barên giran para mêran, para mêran  
barê giran in. Te ew li pijta xwe kiriye û daye kaja çiyayên  
ko bi rê ve bilindtir û asêtir dibin.

Rica dikim mamoste. Ez bawer dikim bi tenê ji bo ku tu  
dilê min xwes bikî tu vê dibêjî. Lê ez dixwazim cenabê te  
pê bizanibe ku ev barê giran min ji ber bîrbirî û dûrbîniya  
te hilgirtiye. Ger min berxwedana te nedîtiba, ez bi  
zanebûna te nehesyama û ez bi şîretên te perwerde nebû-  
ma, bawer bike mamoste, min ê nikarîba bi barekî giran  
bi çiyê ve rapelikiyama. O niha jî gava ez bi çiyê ve hildikijim  
ez diwestim. . . Herçend hildikijî û ji dejtê dûr dikevî, diwestî, lê ew  
çend

zexm û xurt dibî. Hawîr diguhire, tijtinin welê dibînî ko bi te nenas in. Ji dûr ve leylanan de, dinyake nû, ji bo te nû bi xwe kevn lê jibîrkirî, dibînî.

Gelo ew çi dinya ye? Ma ji bo wê derê hêja ye ku mirov evqas cefayê bikisîne?

Ew der gulîstan, gulgejtek e. Tê de avên zelal diherikin, mêngên rengereng wek keskesorên ezmanî diçirisin. Darên wê tev kesk û bijkivîne, xelkê wê delal, ciwan û xurt, herçî mêr zava herçî jin hêj nû bûk in. Ew dinya tu bi xwe yî, ew kurdanîye.

"3

Bi rastî zehmet e, carinan mirov diweste. Gelo pêsniyazeke mamoste ji bo berdewamkirina vê riya asê heye?

Carinan lingên te dijemitin, dikevî xwîjeyan, di jawan re diçî, di ber zandoran re disekinî, li kûriya wan dinihêrî. Çavên te jeverej tên, xilmajî dibî, dilê te jibîr ve diçe, pêlekê li wê dimînî. Erd qelaç e, jînahî ne diyar in. Di dora te de tenê çend pel tihnav hene. Bi bihna wan di xwe dikî der, hijyar dibî û didî rê.

Bas e, ez didim rê, lê ez ê bi ku ve biçim? Yanî cenabê te dixwaze bibêje ku ez hê jî xwe bas nas nakûn?

Xorto! Te berê xwe daye mizgefteke welê ko ji awîze û fanosên wê tenê ruhniya xwejiyê diherike. Tu tê de di ruhnî û tariyên wê de bi xwe bihesî bîr bibî, bîrewerî heyina xwe bibî.

Tu ê bizanî ko heta niho neyînê de bûyî.

Mamoste, ji kerema xwe re rewsa xwendevanên me jî li ber çavan bigire û bêî ku tu zêde felsefe bikî, armanca min rast û vekirî bibêje.

Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye.  
Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e.

Bas e, cenabê te, bavê te, birayên te, mamên te û gelek  
dost û hevalên te jî bi dû vê armancê ketin, lê negihîstinê.  
Gelo sebaba vê çi ye? Tu bikaribî ji kerema xwe re vê  
"4

Bi rastî zehmet e, carinan mirov diweste. Gelo pêsniyazeke  
mamoste ji bo berdewamkirina vê riya asê heye?

Carinan lingên te dijemitin, dikevî xwîjeyan, di jawan re di-  
çî, di ber zandoran re disekinî, li kûriya wan dinihêrî. Çavên  
te jeverej tên, xilmajî dibî, dilê te jibîr ve diçe, pêlekê li wê  
dimînî. Erd qelaç e, jînahî ne diyar in. Di dora te de tenê  
çend pel tihnav hene. Bi bihna wan di xwe dikî der, hijyar  
dibî û didî rê.

Bas e, ez didim rê, lê ez ê bi ku ve biçim? Yanî cenabê te  
dixwaze bibêje ku ez hê jî xwe bas nas nakûn?

Xorto! Te berê xwe daye mizgefteke welê ko ji awîze û fanosên  
wê tenê ruhniya xwejiyê diherike. Tu tê de di ruhnî û tariyên  
wê de bi xwe bihesî bîr bibî, bîrewerî heyina xwe bibî.

Tu ê bizanî ko heta niho neyînê de bûyî.

Mamoste, ji kerema xwe re rewsa xwendevanên me jî li  
ber çavan bigire û bê ku tu zêde felsefe bikî, armanca  
min rast û vekirî bibêje.

Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye.  
Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e.

Bas e, cenabê te, bavê te, birayên te, mamên te û gelek  
dost û hevalên te jî bi dû vê armancê ketin, lê negihîstinê.  
Gelo sebaba vê çi ye? Tu bikaribî ji kerema xwe re vê

"4

armancê hebekî jirove bikî wê baş bibe.

Armanca te li ber te sekinî ye. Di jeklê mirovekî de ye. Tu lê dînihêrî, ecêbmayî dimînî.

Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, paruhan hertijtên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêj, yê çepê berpaj diçit.

Laj di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêj, ne jî paj. Ji ber ko ji aliyekî pêj ve, ji aliyê din paj ve tête kijandin.

Tu zanî çira xorto?

Çiramamoste?...

Lewma ko herdu ling ne yek in. Navbera wan de yekîtî nîne.

Divêt, tu bixebitî van herdu lîngan bi aliyekî ve bilivînî.

Mamoste, ev bi rastî pir zehmet e. Cenabê te bi xwe nikarî

bû herdu lîngan bi aliyekî ve bide livandin. Malbata

te nikarîbû. Ez naxwazim dilê cenabê te bihêlim, ger bi

rastî bi tenê malbata te ji hev neketiba, mamê te Yezdan

Şêr, di dema xwe de ji rê derneketa, ez bawer dikim em ê

îro dewlet bûna. Ez dizanim tu jî naxwazî tiştên çûye zê-

de tev bidî, te berê xwe daye pêserojê, tu dixwazî em niha

bibin yek û ji bo vê yekîtiyê jî tu şîretan li me dikî. Şî-

retên cenabê te hemû di cih de ne, heta yekîtî tunebe, em

nagihîjin cihekî. Lê tu dîzanî mamoste, tu devê kê vedikî,

dibêje yekîtî, lê kes ji bo yekîtiya rastî gavê navêje.

Gelo ev hebekî bi dewletên cîran ve jî ne girêdayî be? Ji

ber ku ew gelek caran bi me dilîzin. Tu ji bo vê çi dibêjî?

"5

armancê hebekî jirove bikî wê baş bibe.

Armanca te li ber te sekinî ye. Di jeklê mirovekî de ye. Tu lê

dinihêrî, ecêbmayî dimînî.

Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, paruhan hertijtên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêj, yê çepê berpaj diçit.

Laj di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêj, ne jî paj. Ji ber ko ji aliyekî pêj ve, ji aliyê din paj ve tête kijandin.

Tu zanî çira xorto?

Çiramamoste?...

Lewma ko herdu ling ne yek in. Navbera wan de yekîtî nîne.

Divêt, tu bixebitî van herdu ligan bi aliyekî ve bilivînî.

Mamoste, ev bi rastî pir zehmet e. Cenabê te bi xwe nikarî bû herdu ligan bi aliyekî ve bide livandin. Malbata

te nikarîbû. Ez naxwazim dilê cenabê te bihêlim, ger bi

rastî bi tenê malbata te ji hev neketiba, mamê te Yezdan

Şêr, di dema xwe de ji rê derneketa, ez bawer dikim em ê

îro dewlet bûna. Ez dizanim tu jî naxwazî tiştên çûye zê-

de tev bidî, te berê xwe daye pêserojê, tu dixwazî em niha

bibin yek û ji bo vê yekîtiyê jî tu şîretan li me dikî. Şî-

retên cenabê te hemû di cih de ne, heta yekîtî tunebe, em

nagihîjin cihekî. Lê tu dizanî mamoste, tu devê kê vedikî,

dibêje yekîtî, lê kes ji bo yekîtiya rastî gavê navêje.

Gelo ev hebekî bi dewletên cîran ve jî ne girêdayî be? Ji

ber ku ew gelek caran bi me dilîzin. Tu ji bo vê çi dibêjî?

"5

Xorto! Çarnikar girtiye. Di aliyên rojhilat, rojava û nîvro de sê milletên din hene. Çav û guhên xwe bel kirine li te fedikirin.

Lê ne ji bona qencyê. Hersê jî dijminên te ne.

Ma îro jî rews weha ye mamoste? Ma qey kes ji van ne dostê me ne?



Tu îro di bin nîrê wan de yî. Te dijidînin. Bi xwe ditirsin.  
Ditirsin ko serê xwe rakî. Ji xewa xwe a giran û kevn hişyar  
bibî û hertijtî bîr bibî.

Ê bas e, mirov ê çawan bikaribe zora wan bibe? Em hê jî  
du heb nikarin werin ba hev.

Belê tu hêj ciwan î, zaro yî, nezan î, hov î. Lê bi xurtiya milên  
xwe bi wan dikarî. Ew gihajtî ne, pîr in. Mezin zexm û  
xurtirbûna wan nemaye. Her weku tu zêde bikî ewê kê  
bikin. Gava pelên direxkan jîn dibin, yên darên kevnare diwejin.  
Digel xurtiyên xwe ditirsin.

Gelo çima ditirsin, ji çi ditirsin?

Ji ber ko xurtiya wan derevkî ye. Bi top û tivingan e. Lê bi  
xwe bi laj û canên xwe kal û komik in.

Ew dixwazin çi bilrîn ji min?

Belê xorto ew dixwazin ko tu ji wan re bibî xoşikî. Kirine se-  
116

Xorto! Çarnikar girtiye. Di aliyên rojhilat, rojava û nîvro de  
sê milletên din hene. Çav û guhên xwe bel kirine li te fedikirin.  
Lê ne ji bona qencyê. Hersê jî dijminên te ne.

Ma îro jî rews weha ye mamoste? Ma qey kes ji van ne  
dostê me ne?

Tu îro di bin nîrê wan de yî. Te dijidînin. Bi xwe ditirsin.  
Ditirsin ko serê xwe rakî. Ji xewa xwe a giran û kevn hişyar  
bibî û hertijtî bîr bibî.

Ê bas e, mirov ê çawan bikaribe zora wan bibe? Em hê jî  
du heb nikarin werin ba hev.

Belê tu hêj ciwan î, zaro yî, nezan î, hov î. Lê bi xurtiya milên  
xwe bi wan dikarî. Ew gihajtî ne, pîr in. Mezin zexm û

xurtirbûna wan nemaye. Her weku tu zêde bikî ewê kê  
bikin. Gava pelên direxkan jîn dibin, yên darên kevnare diwejin.  
Digel xurtiyên xwe ditirsin.

Gelo çima ditirsin, ji çi ditirsin?

Ji ber ko xurtiya wan derevkî ye. Bi top û tivingan e. Lê bi  
xwe bi laj û canên xwe kal û komik in.

Ew dixwazin çi bilrîn ji min?

Belê xorto ew dixwazin ko tu ji wan re bibî xoşikî. Kirine se-  
116

rê xwe te daxewin. Zimanê te jêkin û yên xwe bi devê te ve  
bikin. Da ko tu nikarî kurdaniya xwe bi lêv bikî.

Çawan? Ma ew bi rastî dikarin?

Lê tu metirse. Ew nizanin ko avên erdê bi ziwakirina pingavên  
ruyê erdê naçike.

Dîsan nizanin ko kurd ne avzê in, kanî ne. Bi dagirtina  
çem û rûbar bête girtin jî serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber  
bendan de dipingire, rojekê li wan têtê hev di ser wan re diherike  
û wan di bin pêlên xwe de hildiwejîne.

Ez têgihîstim mamoste. Ez niha siyar im, hevalên min jî  
şiyar in, lê millet?. . . Xorto! Tu ji bona hijyariyê dixebitî. Millet  
nivistiye. Di xew

de ye. Ji lewra têtê kujtin.

Yanî tu dihêjî ger millet hişyar bibe wê neyê kuştin?. . . Ma mirovên  
hijyar ko di xwe dikin der têne kujtin.

Her ku ez rewşa me bi bîr tînim, riya gihîstina armancê  
ewqasî bi min dûrtir dibe mamoste! Ger ez mikur werim  
û rastiye bibêjim, problem ne problema millet e, millet  
yek e, lê serkêsên millet nabin yek. Zana nabin yek,

xwende nabin yek, rewsenbîr nabin yek. . .

"7

rê xwe te daxewin. Zimanê te jêkin û yên xwe bi devê te ve bikin. Da ko tu nikarî kurdaniya xwe bi lêv bikî.

Çawan? Ma ew bi rastî dikarin?

Lê tu metirse. Ew nizanin ko avên erdê bi ziwakirina pingavên ruyê erdê naçike.

Dîsan nizanin ko kurd ne avzê in, kanî ne. Bi dagirtina çem û rûbar bête girtin jî serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber bendan de dipingire, rojekê li wan têtê hev di ser wan re diherike û wan di bin pêlên xwe de hildiwejîne.

Ez têgihîstim mamoste. Ez niha siyar im, hevalên min jî şiyar in, lê millet?. . . Xorto! Tu ji bona hijyariyê dixebitî. Millet nivistiye. Di xew

de ye. Ji lewra têtê kujtin.

Yanî tu dihêjî ger millet hişyar bibe wê neyê kuştin?. . . Ma mirovên hijyar ko di xwe dikin der têne kujtin.

Her ku ez rewşa me bi bîr tînim, riya gihîstina armancê ewqasî bi min dûrtir dibe mamoste! Ger ez mikur werim û rastiye bibêjim, problem ne problema millet e, millet yek e, lê serkêsên millet nabin yek. Zana nabin yek, xwende nabin yek, rewsenbîr nabin yek. . .

"7

Xorto! Rêya te dirêj, armanca te hêj dûr e. Lê tu bi rê ketîyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe jî. Armanca te armanca çend nifjan e. Ne tenê armanca te û nifşa te. Gelek rêwiyên din dê bîn û bidin ser şopa te. Her rêwî riya armancê kurt dikit. Ê nû ji wê dest pê dikit ko pêjiyê wî li wê hijtiye. Rêya te ji

ya nifşên din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketine. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji pola bit, destê te hesin.

Rast e ku zevî beyar e. Lê mixabin, gîsinê pola jî di nava vê zeviyê de dihele. Tu zanî çima mamoste, ji ber ku em ji hev hez nakin. Ez bawer dikim heta niha bindestmayîna me jî wê ji vê be. Bi saloxan min bihîst ku tu diêjandin û yên ku tu diêsandin jî yên nêzîkî te bûn. Sebeb çî bû? Çî ji te dixwestin? Gelo mirov dikare bibêje ku ev ji ber çavnebarî û dexsê tê?

Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexs e, berberî ye, jana dexsê ye. Em sîngjar in. Ji derve serma li me dixê. Li hundur em bi janê dikevin. Di nav xwe de em çend ber in. Berekî kiçik serê xwe daniye li ser sînga milletî, li hilavêtina dilê wî guhdar bûye û ji xwe re bê deng û pêjn dixebite. Li dermanê nexwesê xwe digere.

Berekî din heye, li wan temaje dike. Peyayên vê berê dibînin ko wan tijtek aniye pê û hero ditînin. Li wan didexisin. Çima didexisin, ji berdêla ku bidexisin, ma ew jî nikarin tistekî bikin?

118

Xorto! Rêya te dirêj, armanca te hêj dûr e. Lê tu bi rê ketîyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe jî. Armanca te aramanca çend nifjan e. Ne tenê armanca te û nifşa te. Gelek rêwiyên din dê bîn û bidin ser şopa te. Her rêwî riya armancê kurt dikit. Ê nû ji wê dest pê dikit ko pêjîyê wî li wê hijtiye. Rêya te ji ya nifşên din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketine. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji

pola bit, destê te hesin.

Rast e ku zevî beyar e. Lê mixabin, gîsinê pola jî di nava vê zeviyê de dihele. Tu zanî çima mamoste, ji ber ku em ji hev hez nakin. Ez bawer dikim heta niha bindestmayîna me jî wê ji vê be. Bi saloxan min bihîst ku tu diêjandin û yên ku tu diêsandin jî yên nêzîkî te bûn. Sebeb çi bû? Çi ji te dixwestin? Gelo mirov dikare bibêje ku ev ji ber çavnebarî û dexsê tê?

Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexs e, berberî ye, jana dexsê ye. Em sîngjar in. Ji derve serma li me dixê. Li hundur em bi janê dikevin. Di nav xwe de em çend ber in. Berekî kiçik serê xwe daniye li ser sînga miletî, li hilavêtina dilê wî guhdar bûye û ji xwe re bê deng û pêjn dixebite. Li dermanê nexwesê xwe digere.

Berekî din heye, li wan temaje dike. Peyayên vê berê dibînin ko wan tijtek aniye pê û hero ditînin. Li wan didexisin. Çima didexisin, ji berdêla ku bidexisin, ma ew jî nikarin tistekî bikin?

118

Hingê ew jî dil dikin tijtekî bikin. Lê mîna tijtê çêkirî an jî çêtir nikarin bînin pê.

E bila wê çaxê alîkariya çêkîroxan bikin, ma ne ji bo wan e ji?

Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkîroxan bikin û ê çêkirî pêjve bibin û bi ser xin. Lê dexsa wan nahêle.

Mamoste, dexs tiştekî xerab e, xwediyê xwe dixwe. Bifikire, her cara ku yek tiştekî baş bike ew ê bidexisin, ew dexs wê dilê wan biêşîne, xewa wan li wan birevîne, wê

bêhteng bibin. Ev hebekî jî dijibe dilxerabî û kumreşiyê.  
Ev yeka han jî dilresiyê bi xwe re tîne. Cenabê te ji  
min çêtir dizane. . . Ax ew jana xedar bi pêsîra wan girtiye, wan  
diêjîne, dikuje.

Gelo çima, sebab çi ye?

Ji ber ko çênekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên din jî çê-  
kin. Çiku ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çê-  
nabe. O holê çavê xwe didin xirabiyê. Ji nekêrhatiya xwe bi  
tevr û bivir li ser avahiyên ko hinekî din lêkirine, radibin. Li  
wan dikevin, lê bivir û tevrên wan ne li avahiyan lê li ling û  
ejnûyên wan dikevin. Tu zanî Xorto ew wek çî û kî ne?

Ew mîna çî û kê ne, mamoste?

"9

Hingê ew jî dil dikin tijtekî bikin. Lê mîna tijtê çêkirî an jî  
çêtir nikarin bînin pê.

E bila wê çaxê alîkariya çêkiroxan bikin, ma ne ji bo wan  
e ji?

Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkiroxan bikin û ê çêkirî pêjve  
bibin û bi ser xin. Lê dexsa wan nahêle.

Mamoste, dextîştêkî xerab e, xwediyê xwe dixwe. Bifikire,  
her cara ku yek tiştêkî baş bike ew ê bidexisin, ew  
dextîştêkî wan biêşîne, xewa wan li wan birevîne, wê  
bêhteng bibin. Ev hebekî jî dijibe dilxerabî û kumreşiyê.

Ev yeka han jî dilresiyê bi xwe re tîne. Cenabê te ji  
min çêtir dizane. . . Ax ew jana xedar bi pêsîra wan girtiye, wan  
diêjîne, dikuje.

Gelo çima, sebab çi ye?

Ji ber ko çênekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên din jî çê-

kin. Çiku ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çê-nabe. O holê çavê xwe didin xirabiyê. Ji nekêrhatiya xwe bi tevr û bivir li ser avahiyên ko hinekî din lêkirine, radibin. Li wan dikevin, lê bivir û tevrên wan ne li avahiyan lê li ling û ejnûyên wan dikevin. Tu zanî Xorto ew wek çî û kê ne? Ew mîna çî û kê ne, mamoste?

"9

Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stuyê xwe re tewandiye û li sînga ezmanê zelal tif dike. Tu bi xwe bîr dibî ne, ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyên wan. Ji xwe rêvîn bûn, yekcar dibin seg.

Hin hene dixwazin bixebitin, lê tu kes naxwaze li ber destê yekî din de bixebite. Dil û çavê herkesî di serdestiyê de ye. Herkes dixwaze bibe axa, lê çavê tu kesî di peyatiyê de nîne. Ji lewra di nav me de axa nînin û herkes axa ye. Lê tu ê holê nekî.

Çima? Ma çiyê min ji yên din guherî ye?

Tu bi awakî din bixwedî bûyî û hatî gehandin.

Ma heqê min û mezinahiyê tune ye?

Belê tu jî li mezinahiyê bigerî. Tu jî dê bixwazî bibî axa. Lê ne bi vî rengî.

Bi kîjan rengî mamoste?

Xorto! Guh bidêr. Rind bala xwe bide. Berê pêşîn tu ê bêxî serê xwe ko tu xulamê millet û paleyê welatê xwe yî tu ê xizmeta wî bikî û ji bona wî bixebitî. Dîsan tu ê bizanî ko axayên rastîn ew in ko xulamiya milletê xwe dikin, ên din tevda axayên derewîn in.

Tu dikarî hinekî jî li ser metoda xebatê rawestî? Divê mi-

120

Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stuyê xwe re tewandiye  
û li sînga ezmanê zelal tif dike. Tu bi xwe bîr dibî ne,  
ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyên wan. Ji xwe rêvîn  
bûn, yekcar dibin seg.

Hin hene dixwazin bixebitin, lê tu kes naxwaze li ber destê  
yekî din de bixebite. Dil û çavê herkesî di serdestiyê de ye.  
Herkes dixwaze bibe axa, lê çavê tu kesî di peyatiyê de nîne.  
Ji lewra di nav me de axa nînin û herkes axa ye. Lê tu ê holê  
nekî.

Çima? Ma çiyê min ji yên din guherî ye?

Tu bi awakî din bixwedî bûyî û hatî gehandin.

Ma heqê min û mezinahiyê tune ye?

Belê tu jî li mezinahiyê bigerî. Tu jî dê bixwazî bibî axa. Lê  
ne bi vî rengî.

Bi kîjan rengî mamoste?

Xorto! Guh bidêr. Rind bala xwe bide. Berê pêşîn tu ê bêxî  
serê xwe ko tu xulamê mîlet û paleyê welatê xwe yî tu ê xizmeta  
wî bikî û ji bona wî bixebitî. Dîsan tu ê bizanî ko axayên  
rastîn ew in ko xulamiya mîletê xwe dikin, ên din tevda  
axayên derewîn in.

Tu dikarî hinekî jî li ser metoda xebatê rawestî? Divê mi-

120

rov çî bike?

Dema ko tu dixebitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din  
dixebitin an ne. Herçî ko dixebite karê xwe pêk ditîne û karê  
tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Herdar bi pelên xwe sayedar  
e, ne bi pelên darên dorê.



Ez ne bi tenê me, gelek hevalên din jî dixebitin, ez ji wan jî hîn dibim, xebata wan jî min kêfxwes dike. . . Tu ne bi tenê yî. Di dora te de hinên din jî hene ko dixebitin.

Heke te tijtek pêk anî li dora xwe fedikire, li tijtekî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûz bibit. Hûn hemî ji bona avahiyekê dixebitin. Her kî ji we hîmê wî daniye Xwedê jê razî bit. Pesn jê re bit, heqê wî ye. Hûn jî herin dar û qirj, herî û kevirî peyda bikin. Dîwar an banekî wî çêkin. Navdidaniyê bidin. Lê ne ko bidexisin.

Ez jî fêhm nakim, lê hinek didexisin.

Tu ketiyê cînariya yekî ko avahiyek bi du mezelan aniye pê. Tu di xwe re wê xurtiyê dibînî ko bikarî avahiyeke çend tayîn û mezeln ber pê bikî. Li avakirina mala mezin bi xerabkirina a biçûk dest pê meke.

Ez jî bi te re me. Bi a min divê mirov mala mezin li ser a biçûk ava bike, ne ku mala biçûk xera bike. Ez bawer dikim ger avakirin li ser xerakirina tijtekî din be, wê ew

121

rov çî bike?

Dema ko tu dixebitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebitin an ne. Herçî ko dixebite karê xwe pêk ditîne û karê tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Herdar bi pelên xwe sayedar e, ne bi pelên darên dorê.

Ez ne bi tenê me, gelek hevalên din jî dixebitin, ez ji wan jî hîn dibim, xebata wan jî min kêfxwes dike. . . Tu ne bi tenê yî. Di dora te de hinên din jî hene ko dixebitin.

Heke te tijtek pêk anî li dora xwe fedikire, li tijtekî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûz bibit. Hûn hemî ji bona avahiyekê

dixebitin. Her kî ji we hîmê wî daniye Xwedê jê razî  
bit. Pesn jê re bit, heqê wî ye. Hûn jî herin dar û qirj, herî û  
kevirî peyda bikin. Dîwar an banekî wî çêkin. Navdidaniyê  
bidin. Lê ne ko bidexisin.

Ez jî fêhm nakim, lê hinek didexisin.

Tu ketiyê cînariya yekî ko avahiyeke bi du mezelan aniye pê.  
Tu di xwe re wê xurtiyê dibînî ko bikarî avahiyeke çend tayîn  
û mezeln ber pê bikî. Li avakirina mala mezin bi xerabkirina  
a kiçik dest pê meke.

Ez jî bi te re me. Bi a min divê mirov mala mezin li ser a  
biçûk ava bike, ne ku mala biçûk xera bike. Ez bawer dikim  
ger avakirin li ser xerakirina tijtekî din be, wê ew

121

avakirin jî pasê ji aliyê tistekî din ve were xerakirin. Yanî  
ez dixwazim vê bibêjim mamoste, gava mirov dest bi karekî  
nû dike, gelek zehmetî dikarin derkevin pêşberî mirov,  
ew zehmetî jî dikarin bibin sebaba hin kêmasiyan.

Pirsa min ji cenabê te ev e; gava mirov kêmaniyekê bibî-  
ne, divê metoda destnîsankirina wê kêmaniyê çawan be?  
Di dinyayê de tu tijt nîne ko tekûz bît. Di hertijtî de, nemaze  
di karên nû dest- pêkirî de, pirê caran, kêmanî heye. Heke  
te ew kêmanî dîtî, hima dirêjî wan meke. Lê bixebite ko  
tu bikevî nav wan, arîkariya danîyan bikî û wan kêmanîyan  
biedilînî.

Ez dibêjim xerakirin ji avakirinê hêsantir e. Ger cenabê  
te bi gotineke gelêrî vê bîne zimên em ê kêfxwes bibin?  
Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna  
xwêl de ye. Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an arîkariya

ewan bike ko çêdikin, ava dikin.

Ger mirov nikaribe bi xwe çêke. . . Heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkroxan bikî

hingê bi ên çêkirî ja û kêfxwej bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona milletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne.

Te got, ger nikaribî çekî, alîkariya ewan bike ko çêdikin

122

avakirin jî pasê ji aliyê tistekî din ve were xerakirin. Yanî ez dixwazim vê bibêjim mamoste, gava mirov dest bi karekî nû dike, gelek zehmetî dikarin derkevin pêşberî mirov, ew zehmetî jî dikarin bibin sebaba hin kêmasiyan.

Pirsa min ji cenabê te ev e; gava mirov kêmaniyekê bibîne, divê metoda destnîsankirina wê kêmaniyê çawan be?

Di dinyayê de tu tijt nîne ko tekûz bît. Di hertijtî de, nemaze di karên nû dest- pêkirî de, pirê caran, kêmanî heye. Heke te ew kêmanî dîtî, hima dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya danîyan bikî û wan kêmaniyan bidedilînî.

Ez dibêjim xerakirin ji avakirinê hêsantir e. Ger cenabê te bi gotineke gelêrî vê bîne zimên em ê kêfxwes bibin?

Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye. Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin.

Ger mirov nikaribe bi xwe çêke. . . Heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkroxan bikî

hingê bi ên çêkirî ja û kêfxwej bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona milletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne.

Te got, ger nikaribî çekî, alîkariya ewan bike ko çêdikin

122

ava dîkin... Ez dibêjim ev hebekî bi bawerî û hêza însên ve girêdayî ye. Mîna cenabê te jî pê dizane, di Incîlê de jî, dibêje; ger lbaweriya te Sîelbe û xurt be, tu bixwazî tu ê bikarilbî M baweriya xwe ya xuirt çiyayê hember wergerî-nî...

Xorto! Min got heke tu nikarî çêkî. Lê bawer bike, ewle be ko te dil hebe tuyê bikarî jî. Herçî ko dixwaze dikare jî.

Lê gava mirov dike û lbi ser dikeve, hin kes kêfxwes û dil-şa dibiH, hln kes jî didexîsiri. Dixwazin bi dexsa xwe dilê mirov Mşikînin. Tu ji vê re çî dibêjî'î mamoste?

Wekî tu dixebitî dexesker ji dora te kê m nabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe.

Gelo ger ez di xelbada xwe de bişemitim û bikevim, ew ê desê alîkariyê dirêjî min ndkin?

Heke di riya xebata xwe de jemitî û ketî, tu zanî ew ê çî bikin.

Mebêje ko ew ê bèn bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî nejikiyaye.

£, gavffi yek xelbateke lbaş û bi serketî bike, mirovên qenc yên km alîkariya xebaîa baş bikin nînin?

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatpa-

123

ava dîkin... Ez dibêjim ev hebekî bi bawerî û hêza însên ve girêdayî ye. Mîna cenabê te jî pê dizane, di Incîlê de jî, dibêje; ger lbaweriya te Sîelbe û xurt be, tu bixwazî tu ê bikarilbî M baweriya xwe ya xuirt çiyayê hember wergerî-nî...

Xorto! Min got heke tu nikarî çêkî. Lê bawer bike, ewle be

ko te dil hebe tuyê bikarî jî. Herçî ko dixwaze dikare jî.  
 Lê gava mirov dike û lîbi ser dikeve, hin kes kêfxwes û dil-  
 şa dibî, hîn kes jî didexîsiri. Dixwazin bi dexsa xwe dilê  
 mirov Mşikînin. Tu ji vê re çî dibêjî'î mamoste?  
 Wekî tu dixebitî dexesker ji dora te kê mabin. Tu guh mede  
 wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe.  
 Gelo ger ez di xelbada xwe de bişemitim û bikevim, ew ê  
 desîe alîkariyê dirêjî min ndkin?  
 Heke di riya xebata xwe de jemitî û ketî, tu zanî ew ê çî bikin.  
 Mebêje ko ew ê bîn bi destê te bigirin, birînên te derman  
 bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî nejkîyaye.  
 £, gavffi yek xelbateke lîbaş û bi serketî bike, mirovên  
 qenc yên km alîkariya xebaîa baş bikin nînin?  
 Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatpa-  
 123  
 rêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Ên dexisok tu zanî dê  
 çî bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa  
 wan nahê. Ew ê bêjin: Ma evî çî kiriye, ji bona xwe xebitiye  
 û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev  
 jî tijtek e.  
 Yanî tu dibêjî digel mirovên qenc wê mirovên dexsok jî  
 hebin. Heta, ji ber ku mirov xebateke qenc dike, wê mirovên  
 ku bêsebeb berberiyê bi mirov re bikin j'î derkevin.  
 Xorto! Herçî ko bi te re berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji  
 xwe di dewra gelekî de stirî bi hezarî ne.  
 Ez bawer dikim mamoste, niha em hebekî hatine guhertin.  
 Ew striyên ku cenabê te behs dike, j'i hezaran daketine,  
 kê mabûne. Le belê hê jî hene. Ez dixwazim tijtekî bipirsim,

ma ew xwe bi xwe nakevin qirika hev, bi hev re  
berberiyê nakin?

Ew di nav xwe de nexwey bibin, pev biçin jî, li te dibin yek,  
destên xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmtir in. Kêmaniya  
wan wan digihîne hev.

Ez bawer dikim di tebîetê de jî welê ye. . .

Ji xwe di tebîetê de jî welê ye. Tijtên qenc û hêja hindik in,  
nehêja û bêkêr zahfin.

Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespên kihêl hebin,  
124

rêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Ên dexisok tu zanî dê  
çi bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa  
wan nahêle. Ew ê bêjin: Ma evî çi kiriye, ji bona xwe xebitiye  
û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev  
jî tijtek e.

Yanî tu dibêjî digel mirovên qenc wê mirovên dexsok jî  
hebin. Heta, ji ber ku mirov xebateke qenc dike, wê mirovên  
ku bêsebeb berberiyê bi mirov re bikin j'î derkevin.

Xorto! Herçî ko bi te re berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji  
xwe di dewra gelekî de stirî bi hezarî ne.

Ez bawer dikim mamoste, niha em hebekî hatine guhertin.

Ew striyên ku cenabê te behs dike, j'i hezaran daketine,  
kêm bûne. Le belê hê jî hene. Ez dixwazim tijtekî bipirsim,  
ma ew xwe bi xwe nakevin qirika hev, bi hev re  
berberiyê nakin?

Ew di nav xwe de nexwey bibin, pev biçin jî, li te dibin yek,  
destên xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmtir in. Kêmaniya  
wan wan digihîne hev.

Ez bawer dikim di tebîetê de jî welê ye. . .

Ji xwe di tebîetê de jî welê ye. Tijtên qenc û hêja hindik in,  
nehêja û bêkêr zahfin.

Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespên kihêl hebin,

124

di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarên rej hene. Li  
nik xelkê gundî ne piraniya garanê, lê hindikayiya hespên kihêl  
bi qedir û hêja ye.

Lê ez çi bikim ji wan? Ez jî bi wan re berberiyê bikim, an  
ez guh nedim wan? Di vî warî de sîreta cenabê te wê gelekî  
bi kêrî min were. . . Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko  
eleyhdariya te

dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayên nekêrhatî  
û mivro ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û  
kutekuta wan e.

Mirov dikare vê encamê ji peyvên cenabê te derxe; yanî  
ez guh nedim der û dorê û di xebata xwe de berdewam  
bim. Tu bawer dikî ku ez ê bi ser bikevim?

Xorto! Xebata te mîna dengê ye. Ma deng bi pifkirinê têtê  
vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi  
deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê  
xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pifkirinê natirse ew ê her bilintir, çira te ko  
bi pêjnê nalerize ew ê her gejtir bibe.

125

di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarên rej hene. Li  
nik xelkê gundî ne piraniya garanê, lê hindikayiya hespên kihêl  
bi qedir û hêja ye.

Lê ez çi bikim ji wan? Ez jî bi wan re berberiyê bikim, an ez guh nedim wan? Di vî warî de sîreta cenabê te wê gelekî bi kêrî min were. . . Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko eleyhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayên nekêrhatî û mivro ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û kutkuta wan e.

Mirov dikare vê encamê ji peyvên cenabê te derxe; yanî ez guh nedim der û dorê û di xebata xwe de berdewam bim. Tu bawer dikî ku ez ê bi ser bikevim?

Xorto! Xebata te mîna dengê ye. Ma deng bi pifkirinê têtê vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pifkirinê natirse ew ê her bilintir, çira te ko bi pêjnê nalerize ew ê her gejtir bibe.

125

FIRAT CEWERÎ: Ez ji bo van gotinên te yên xwes û j'i bo vê hevpeyvînê pir spas dikim. Divê ez mikur werim ku di pêvajoya vê hevpeyvînê de ez hînî gelek tiştan bûm; min dinya nas kir, min kurd nas kirin, min xwe nas kir. Dîsan divê ez mikur werim ku her ku ez nêzîkî te dibim, her ku ez fikir û ramanên te fêhm dikim, ez ewçend xwe nas dikim, ez ewçend dixwazim riya te bijopînim, fikrên te belav bikim. Ji ber vê yekê, bi destûra te be, ez dixwazim pêwendiyên me berdewam bin û her tim haya me ji hev hebe. Gelo bi vê ve girêdayî, gotina cenabê te ya dawîçiyê?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Divêt ko her gav me hay ji hev



hebit û gerek e ko em hevdu ser xebata hev serwext bikin. . .

- Firat, Firat! Rabe kurê min, taştê hazir e.

Ez ji nav nivînan hol bûm. Ez di xwêdanê de mabûm, piştî ku hebekî bêhna min hat ber min û ez hêdî hêdî hatim ser hişê xwe, ez rabûm û min dest û ser çavên xwe şuştin. Min di ser taştê de bi kelecana ji Rewşen Xanimê re behsa xewna xwe û Celadet Bedir-Xan kir. Pirs û bersivên hevpeyvînê bi niqte û bêhnokan di bîra min de bûn. Gava min ev hev-  
126

FIRAT CEWERÎ: Ez ji bo van gotinên te yê xwes û j'i bo vê hevpeyvînê pir spas dikim. Divê ez mikur werim ku di pêvajoya vê hevpeyvînê de ez hînî gelek tiştan bûm; min dinya nas kir, min kurd nas kirin, min xwe nas kir. Dîsan divê ez mikur werim ku her ku ez nêzîkî te dibim, her ku ez fikir û ramanên te fêhm dikim, ez ewçend xwe nas dikim, ez ewçend dixwazim riya te bijopînim, fikrên te belav bikim. Ji ber vê yekê, bi destûra te be, ez dixwazim pêwendiyên me berdewam bin û her tim haya me ji hev hebe. Gelo bi vê ve girêdayî, gotina cenabê te ya dawîçiyê?

MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN: Divêt ko her gav me hay ji hev hebit û gerek e ko em hevdu ser xebata hev serwext bikin. . .

- Firat, Firat! Rabe kurê min, taştê hazir e.

Ez ji nav nivînan hol bûm. Ez di xwêdanê de mabûm, piştî ku hebekî bêhna min hat ber min û ez hêdî hêdî hatim ser hişê xwe, ez rabûm û min dest û ser çavên xwe şuştin. Min di ser taştê de bi kelecana ji Rewşen Xanimê re behsa xewna xwe û Celadet Bedir-Xan kir. Pirs û bersivên hevpeyvînê bi niqte û bêhnokan di bîra min de bûn. Gava min ev hev-

126

peyvîna ha derbasî ser kaxezê kir û da Rewşen Xanimê,  
ew ecêbmayî ma, wê bi çavên xwe bawer nekir.

Rewşen û Celadet Bedir-Xan

127

peyvîna ha derbasî ser kaxezê kir û da Rewşen Xanimê,  
ew ecêbmayî ma, wê bi çavên xwe bawer nekir.

Rewşen û Celadet Bedir-Xan

127

Ji rûpelê IOan heta rûpelê dawî, bersivên Celadet Alî Bedir-Xan  
hemû rast in û ji berhemên  
wî hatine girtin. Min ji bo amadekirina vê kitêbê hemû hejmarên  
Hawarê, hejmatên

Ronahiyê, Nameya ji Mustafa Kemal re, Pirsgirêka Kurdî,  
Rojnotên Celadet tev dane û

xwestiye portreyekî wî derxînim. Min zimanê Celadet mîna  
orjînalê histiye, lê min bi tenê

"zman" bi awayê "ziman" nivîsandîye. Herçî Celadet e wî herdu  
awa jî bi kar anîne. Herweha

min hin bersivên Celadet ji kitêbên wî yên bi tirkî wergerandine  
kurdî.

Wêneyê Celadet Bedir-Xan û Firat Cewerî yê li ser bergê dawî,  
fotomonîaj e. 128

Ji rûpelê IOan heta rûpelê dawî, bersivên Celadet Alî Bedir-Xan  
hemû rast in û ji berhemên

wî hatine girtin. Min ji bo amadekirina vê kitêbê hemû hejmarên  
Hawarê, hejmatên

Ronahiyê, Nameya ji Mustefa Kemal re, Pirsgirêka Kurdî,  
Rojenotên Celadet tev dane û  
xwestiye portreyekî wî derxînim. Min zimanê Celadet mîna  
orjînalê histiye, lê min bi tenê  
"zman" bi awayê "ziman" nivîsandiye. Herçî Ceiadet e wî herdu  
awa jî bi kar anîne. Herweha  
min hin bersivên Celadet ji kitêbên wî yên bi tirkî wergerandine  
kurdî.

Wêneyê Celadet Bedir-Xan û Firat Cewerî yê li ser bergê dawî,  
fotomonaj e. 128

FIRAT CEWERF: G~ / o mikt bî bindest bi çi awayî dikarin  
heyîna XW~ ji smksthî XW~ biparizin?

MIR CELADET ALI BEDIR-XAN: Miletên bindest heyîna  
xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi quweta du çekan  
diparêzin.

- Çi n~ ew herdu ç~k?

- OLyek. ziman dido.

- Baş~, mamost~, h~k~ola mikt2 serdest û bindm y~k  
b~, w2 çax2div2 mikt2 bindest kîjan çdl2 li hmıb~rî urdesthî  
XW~ bi kar bîn~ da ku bikarib~ hryîna XW~ biparhe?

- Heke ola milletê serdest ti bindest yek be, hingê çek  
yek bi tenê ye tî bend tenê ziman e.

\*\*

## MARÊ DI TUR DE

Medenî Ferho

EnNtituja Kurdi Ya Itruksrlê

Weşanen Enstituya Kurdî Ya Brukselê û

Weşanên Pêrî

## NIZANIM ÇI BÊJIM

Destpêka her tiştî zor e birazî.

Çîrok bi gotinekê dest pê dikin, bi gotinekê bi dawî tên.

Ku min dizanîba çawa dest pê bikim, bi hêsanî ezî bigihime Di nava asoyên ne diyar de winda. Heya niha dawiyeye bê encam, di nava şlahiya demûşî de kelpitî, şemîtonkî derketiye hemberî min. Zelîqonkî!.. Ezmanê dilê min her dem di nava şeln û teqûreqa tavan de dinale. Stêrikên dilê min, mîna belgên daran ku di payiza dawî de ber bi ba dibin, bi her tevger û qerqeqûnê re dilerizîn, diweşin. Demsalên dilê min, Bihara bi ronbîniya gulbijêrkan xemi-landî nabîne. Bihar li ber min winda bûrejPayiz û Zivistan bûne coğrafya dilê min. Payizê zemherî dibare, kambaxiya pelweşên e, Zivistanî qeşa ye, qotika zikdirrên e. Bêhna barudê... Wîzêna beran... Çerxa zingarî... U pîkola mirinê ku li dora mirov dike. Hawar û gazî... Qîrêna waweylê hêviyên winda...

Ku min dizanîba... Ku min dizanîba!...

Hew birazî xwediyê miriyan kor in. Mirî em bûn, xwedî em bûn. Me xwe dixapand, me nedixest rastiya xwe bibinin. Rastî hemberî me bû û em ji rastiya xwe direviyan. Heya îro jî, îro jî em ji rastiya xwe direv u. Rastiyeke ku di nava kaviil û hêrikên dîrokî de dimelise, bi çavên têr tirs û şermokî li me dinêre. Awirên şikestî!.. Qersifî!.. Û me nidixwest fam bikin.

Me ne dixwest!.. Ji têghiçtinê dur, ji rastiyeke revok...

Birazî, bêje min te çend sal kirine?

Sersala pêşî ku tu bi hevalên xwe re, bi qirdik, pîrê salé, bûk û zavê re li sersala cîran û gundiyan geriyayî bi bijêre. Her çend salên zaroktiya xwe, wan rojên di nava asoyê dilê bê xem de lotik didan jî... De bêje!... Te di çend saliya xwe de çavên xwe, bi ewrên bê

baran re ji keçika cîran re şikandin? Lîstika çirrê, navbir yanî û tuştê... Tevşo!.. U bizdimbadima hevalbijêrk... Li ber agirê şevîniyê, ku damistonka te bi dilê te bû, wan salên di nava şev û rojên kin û dirêj de hatine hûnandin, teva ne hejmêre. De bêje lo!.. Birazîkê min î delai, li rudêna min binêre, xerpîşonkên li eniya min, bi ser hevûdin de, mîna newal û geliyên dora Êlînê, pêl bûne û piştire ji mamê xwe re bêje. Da ez dizanibim nîrxê salên bi ser hevûdin de bûne şikêrên kêvjalî çiqas in... Da ez dizanibim bê di kûraya dilê min de dikaribin bibin şîna kaviên dîrokî, yan na. Her kevir û kûçên li ser hevûdin nijinî, piştire bi top û cebilxaneyên Roma Reş bi ser hevûdin de pelixî, çawa mîna xencereke Isa Begî birîneke bê derman vekiriye. Her keviyek birînek, her rojek qîrînek, her birînek kuştîyek. U gorîstanên mil dane hev... Şikâren mêran li ser dilê min rûniştine.

Havîn wêranî bû. Bihar despêka şewat û talanan bû. Payiz dengê dahola şer û cengê bû. Zivistan, zêdebûna gorîstanên bê kêl bû. Salên têr efsaneyî, di nava dilojarêya jinên çav şerbitî, dil kewitî, kezeb herhilî de dimelisîn. Keçên evîn şikestî, awir qersifî, stuxwar di nava salan de dibelqitîn. Demsalên destanî ku helbestvan mîna diruna dexla bi das û qeynaxan dikevîne ber û dibêjin. Hê wernê wernê/Hê wer ne darxizêmê... Destanên bi ser hevûdin de hêrivtî. Alfabeya wînda... Gotinên kimizî!.. Çarîneyên bê pîvan, li ser û guhên hev de ketin.

Birazî tu şer nas dike? Teqîna bomban, borbardumana balafiran, fişekan, lorandina mozoliyan, welîn û xirîq xirîqa tirsê, sehwa mezin û reva ji ber mirinê?

Dema ji erd û ezman mirina di nava cefta gemarî de pêçayî dibare...  
Ji erdê mîna nafûra Nuhê Kal bilind dibe... Heft xwezîka min bi wî  
mirovê ku bi darbeya pêşî re can bide...

Roja ku di kefa mista te de darê tivingê rûnişt, qeftê xencerê bi  
teliyên destên te re bû destûbirak, ji min re bêje temenê te dibe  
çend. Ku ez ji birazîkê xwe re çend gotinên di nava salên kevnare de  
winda mayî bêjim. Serpêhatiyên bi berê topan hatî parçe kirin.  
Serpêhatiyên bi riyên winda, şevân kasulî û bexîl re bûne  
destûbi-rak... Bi darbeya xencer û berê metrelyozan birîndar bûyî.  
Devê birînên ku zincîra seatî û guhikê jarê bostek û çar teliyan tê de  
xewr dibin. Her serpêhatiyek bi xwînekê hatiye şîştin, her bûyere  
ku di nava awaz û hawara jinên bî de hatiye kefen kirin, her  
serpêhatiy ku di nava dilê keçikên evin şikestî de hatiye veşartin, ji  
te re

Xorto, serpêhatî û bûyerên min di defter û pirtûkên dibistanan de  
nînin. Di nava rûpelên ansîklopediyên sedsala bîstan de cih ne gir-  
tine. Teva di nava salên winda, rojên şikestî, coxrafya kna bûkê,  
dîroka talankirî de razayî ne.

Rojên hejmartî!.. Rojên min hejmartî ne, îsal nebû, yekî din, yekî din  
nebû yekî din... Sal ku ketin ber şibaqa hejmartinê, mirina çavreş  
nêzîk e, wê bête serdana te, bi pateyeke Romani 'xurfanf bilorîne.  
Pîrbûn!.. Warê ne tukesan e. Qonaxa kura bûkê ye!. Qonaxa çerxa  
feleka têr gevzînok û têr xapînok e. Bircikên dilê mirov di lerizînin.  
Qermîçonkên li hev badayî di rûdêna mirov de rudinin. Tu nikaribe  
xwe amade bike, kopal te dibîne. Xelasiya binaya çavan te dipêçe.  
Binêr, kopalê destên min ji Binya Xetê, cem pismamê min hatiye.  
Pismamê min ku ez bûme têba, ez bûme xewneke giran û di serdilkê  
wî de runiştim şandiye. Roma Reş ne bes bû, ez jî ketim zîqa wan û

bi birr û qeflên mêrên simbêl qeytan re ârîş kire ser wan. Ne carekê, ne diduwanL. Ne carekê, ne diduwan û ne di şerekî bi tenê de!... Bavé min dest pê kir, heya giha min û em binêrin wê bigihê kuderê... Temenê te xorto!.. Çiqas be!.. Rojan bide ser hevûdin, bike kâşî, bide hev, bike cêzî, bike şikâr liqasî serpêhatiyên min nabin. Tişteki bi tenê!.. Serpêhatiyêke bi tenê, ez kuştim. Ez ne mirandim, bi saxîti ez kirim gorê, wilo nîv saxî, çavên min bel, kêl danîne ser sînga min, bê ax û ne temirandî... Bi kelbitan û muçingan, bi çakuç û miqaran canê min hêdî hêdî stand. Heya îro, min ji kesî re, ji ademîzadeyekî re ne gotiye.

Çîroka ku bi xwînê dest pê kir û wê bi xwînê bi dawî be.

Cara ku tê bîra min, mina serê kopalê min ku di nava axzerkê de diçe û tê, dixepêre, wilo kevçika dilê min, di nava cendereyêke bi sîxur dixepêre. Tevzînokên têr qolincî li nava ezayê laşê min, hurik hurik bela dibin, bi gevzeka gezgezke bela dibin. Şahdamare min, ji nava kursiyê mixaza her du polên min, têne kişandî Xwîntewrênek di nava laşê min de, wilo deqdeqî, germika qolinc xwe kifş dike. Şewta kopalê hêzeranî, bi şewteke arînî li bela dibe.

Te çi dîtiye birazî!

Ji wê toza nava bender û ramadîlka guhê nava gund û pê de. Goka li gastînan ku hui belki!.. Ê çî din!.. Bêje min te çi dîti

Bînêr, binêr!.. Di nava rûpelên pirtûkên dibin çengên te de got- inên min, gotinên di nava Kûra Zerzemîn de pelixî bûne hene, yan na. Binêr!.. Sewm û selatên dilê şikestî, sewm û selatên erdaku Ava Mezin cihê xwe tê de çêkiriye, keskûniya Zembilfiroş û dîlzariya Xatuna Mîr di nava wan reşbelakan de heye. Binêr!..

Belkî carinan Ferîda Mala Hecî Ezîz, ji serê banê Kevirê Bel, yan jî serê Neqabê, dengê xwe li te kiriye, yan jî Helîma Mala Teter, ji serê

girikê Kêlo horênî bi ser Çala Dirba de werdikir. Kevir û kûç, karik û pez, karwan û şivan ji şerê wan direviyan. Qîre-wîra wan teva, bo karwan û şivanên gund ne kevine rez û werzan, ziyanan nekin! Her du jinan natoriya kedê, nobedariya rebeniyê dikirin... Weşik tirî, şebeşek, petîxek ne zîyan e. Tinazên rojê ne, ker, bergîr, hêstir û golikên filankes kete zîyanê bêhvankes, şivanekî pezê xwe şemirand, kete nava dexla bêhvankes, tiştên biçûk in, mijulahiya rojê ne. Ez, behsa dîrokê dikim ji te re. Dîroka ku min bi destên xwe wêran kiriye. Di malzaroka wê de xencera Isa Begî çikandiye!.. Ez behsa wê dîroka têr şiltaqî, têr ger û govenda mirinê dikim. Behsa dîrokê, dîroka mîrate... Mîrate, bê dunde çûyî!..

Bablîsokên payizî, toz û remadîlka Beriya Xelef Axa teva anî li ser wê dîroka talankîrî danî. Ne kuştîyân Eleqemşâ radibin û ne ter- mên Newala Kuştîyan radibine ser xwe. Pelqîzana ser dilê min tejî ava iledarî bûye, ev e. Xwîna kurmî bûyî qemuşk girtiye, ne derziya doktoran digihiyê, ne dermanê Lokman Hekîm çarê tê dike. Ji hinduru ve min dixwe. Qijnika ku li ser pelqîzana dilê min rûniştiye... Xwîna min, têhnika bihiştî ya jînê dimarêse, hinavên min pûç û mîrate dike. Mêjiyê min kurmî dike. Kula têr hişim, di na sîngesîra zilindarî de ku êrîş dike ser mêjiyê min, ewr û siha li ser ronîya çavên min, dax dide..

Keliha di nava asoyê dilê min de bi ser hevûdin de dihêrivîne.

Kelhoşkên dilê min şikestî ne.

Û lorîneke bê gotin...

Û ava sift, bê têhnik...

Weke ku tu sê navê xwedê bi hejmêre... Navên şîne bang dîkin, di nava albûma bê fotoğraf de, rê wînda kirî...Sê navên ku cihê jînê, ji mirinê re berdane. Navên zexeliyê!.. Bêhn çikiyayî, firşik werimî,



kelendorî... Navên ku tenê rikêrî hêlîna mişk û maran, kêzik û kur-  
mikan, belkî navên mirina bi saxî, hewqasî jar û bêdar, tên. Sê nav,  
sê navên li ser lêvan ranawestî, di hiş û bîra kesî de namînî û qet,  
qet di pirtûk û reşbelekên dibîstanan de, di destanên kevnare de ci  
nagirin, qet nabin navê zarokan. Li min bikin... Sê navên yarenî, li  
min bikin û bangî min bikin... Sê navên têr yarenî...

XeşîmoL

Nezano!..

PoşmanoL

Mirovê ku li navê xwe bimîne heyirî, keliha wêran, ku tenê bikêrî  
hêlîna cird û tevnepîrkê tên e. Dergûşa dilşikestî, şopandina  
nezanîne ne. Lewleba movikên stana pişta her sê nava hêrivî ne.  
Xaliqallah!..

Rê neman, şivîle wînda bûn, rêwingiyên azadiyê, cengawerên ku di  
nava pêlên derya jiyane de, hemberî herka avê sobahî dikirin, teva  
xeniqîn. Dilopên avê û xwîne tevî hevûdin bûn. Pelê dara dilê  
kelhoşka jiyane, dara bi tenê, zereve, di nava xwîsiya mirinê de  
quriftin. Qamuşka erdê qelişt, di kûraya dilê erdê de pêtên agirê  
azadiyê di mitikê çiyarêzên Kurdistanê re furiya. Nafûr bûya kafûr!..  
Agir dibare Xwedo, agir!.. Erd û ezman kete nava çirava agir.-Agirî  
û Cudî!.. Bagok û Mava bûne xweliya demsalan.

Tora Hevêriya bi yek carê, seranser di nava hevûdin de dikelî. U ez,  
di nava pêtên agir de pêçayî li ser kursiyê dewleta Romê rûniştî  
dikeniyam. Tiqtiqa kenê min ji nava Omeriyan heya bigihe Erebiyan  
li ser pelê ewrên têhnik şikestî digeriyan. Deşt û newalên bêhn  
birehayî, tengijî, di nava keftelefa bê wate de bi ser hevûdin de  
pelixîbûn. Tovê waweylê bû!.. Ya kesnedî!. Naqosa hawarê lê dida,

çekên keskûniyê di teqiyân. U mirina birçî, khur devê xwe vekiribû.  
Di qurpand, ha ha...

Tora Hevêriya di kefa mista min de dibirijî.

Ez di ijdeh-nozdeh, gelek gelek bîst saliya xwe de bûme serekçetê dewleta Tirk.

Serekçete...

Temenê me jî, di nava dîroka ax û ava me de, ketiye nava toz û dumana winda. Lewra nasname nine, lewra kefa mista me vala ye, kortika çavên me werimî, di nava hilçenîna dengê neferan de diler-izî.

Xwedê dihebîna bêje min, bersiva min bide, bêje, eger di dersên dibistana te de tiştên wiha hebin, qet li min nîne, deng nakim, gotin ji devê min demakeve. Bêje mamê xwe birazî. Min gelek neweyî dîtine, min gelek teşqele û xap û rîpê cihanê dîtine. Mirov bi ser-pêhatiyên xwe, bi ger û sergerdeyiya xwe kôhne dibe. Nifşê we bi pirtûk û boyağa pênuşan kôhne dibe. Li ser masê rûniştî cîhanname li ber we ye, nexşeya cîhanê hemberî we ye, dîrok û coxrafya cîhanê li ser kaba we ye... Hun hêsa fêr dibin, cîhana serê we mezin e, lêbelê cihana dilê we biçûk e. Cihana dilê mirov çiqasî mezin be, derd û kulên mirov hewqasî mezin dibin. Dil, atlasa jiyana mirov e!.. Dil, rengîniya cîhannamê ye!.. Êrêêê erê! Birazî, dema kul û xemên mirov gelek bin, xemgîniya çav û gavên mirov jî giran in. Ka bêje min!.. Hestê qelema te çend ritilan, çend weqiyân dikişine. Bo ez bêjime te tuqla te, giraniya te çend e!. Bêje ku tu derdê mamê xwe nas bike. Min kitek ne xwendiyê, pitik û nîv xwendinê nizamim, belê bipirse, ji coxrafya dilê mirovan, ji dîroka awaza jin û keçikan, ji matematîka hêstirên zarokan, ji fizik û kimya xwîna li ser stana Kurdistanê rijiyayî bi pîrse, da ez birrêna pozberanên hewrî, bilindir

ji te re bêjim. Xet û qermîçonkên rudêna min bi hezaran rûpelên pirtûk û ansîklopediyên bi hezar rûpel hatine nivîsandin in. Keserên ku ji nava pêtên agirê di nava hinavên min de mina bestikên Eleqemşê bi xwîn diherikin cîhannameya heft rengo ye. Her rengê ji wan romanekê dibêje. Çiyarêzên di nava xewrebezê kul û keserên ciwanikên bê miraz de hatine pêçan, bi rengê xemilandî ne. Deşt û newalên ku di xeftanê xirîq xirîqa zarokên tenê mayi re winda, reben û neçar, bi rengê hatine neqîşandin. Beştik, çem û bêrmên ku li nava hevûdin ketine, mina gotin û galgalên Hecî Silê ku bextê xwe xera kir, di fermana Filehan de, sala 1915 an, ku Süryanî dibêjin 'seyfo', bext da gundiyên bêzar û neçar, piştê bi êmnatî ji çek kirin û gûndeki Suryaniyan bi kişumat kuştin, kit ji wan ne hiştin, ocaxa bavê wan tefand, gemarî bûne. Bêbextî, wargehê şermezariyê, kafûra kirêtê ye. Hejmara barîna av û morîkên di nava toz û remadîlka devê dergehên qesir û qonaxan de felcoyî mane, bi rengê hatine hûnandin.

XiyanetL Hingilê tejî iledarî, hêlîna mîjokerî...

Kes nikare van rengên ku bi serpêhatiyan, hurik hurik hatine darvekirin, hurik hurik bi ronîya çavan, bi teliyên ziravik, temtêl xatûnî hatine neqîşandin di nava rûpelên pirtûkan de bibine.

Li gorî hesabên te ez çend sali me.

Tu dikarî hejmarekê bibêje?

Min Osmanî dîtî. Osmaniyên ku bi saya bavê min li Tora Hevêriya bûne xwedî tac û textê seltanetê û piştê ketin xwîna bavê min. Ew bavê ku bi 'nefiramê' re êrîş bire ser Elik, hobicê beranan da kuştin. Elîkê ku ji roja rabû heya hate kuştin, ne hişt Osmanî di nava Tora Hevêriya de li ser kemaxên qûna xwe bi dilaramî rûnin û bêje ohnaay li vê kêlîkê, wilo bi arzani da kuştin. Elîkê ku bi pihîna xwe

devê girtîgeha Nisêbînê vekir û bi qeftê xencerê ârîş dikire ser top û meterilyoz û mozoliyan, ji Osmaniyan re derxiste meydanê, bê kes kir, kuştina wî hêsa kir. Ê Ittihatîyên ku bi komên xelkê re bi devê tiving û xencerê diaxivîn dîtin. Ittihatçiyên zordar bi saya kurê wî mirovê dost û yarê roja tengasiyê û piştire di zîndan û kelihên reş-tarî de bi destên wan hate kuştin û niha gora wî ne kifş e, bûne tacîdarê Tora Hevêriya. Ez kurê wî filankesê ku gora wî ne kifş e û ez bi gora wî ya li axa Entabê, ku min qet ne dîtiye, ji ber vê çendê serîk lênedaye, 'fatîhe'yek jê re ne xwendiyê, bûme rêzanê wan. Bavê min ji wan re kir û ji destên wan ne niemand.

Ez bûme rêzan, bende û serekçetê qatilê bavê xwe.

Birazî, bê çawa bavê min ji wan re kir û piştire kuştin, min jî, heya tu bêjê bes ji wan re kir, dawî gu kirin devê min. Ji kuştina bavê min kambaxtir bû ew gu. Bê qedar temenê min dirêj e birazî. Bê qedar!.. Temenê mirov ne tenê sal in, bûyer, pêhatî... Serpêhatiyên keşûnî ne. Temen, ked, kiryar, bez û reva şevşevokî ye. Ha hewww birazî!.. Tora Hevêriya jî di nava pirtûkên te de nîne. Ne pirtûka dîrokê, ne pirtûka coğrafya Tora Hevêriya xêz kiriye. Heremek ji coğrafya winda kirî ye. Pirtûka matematîkê hesabên xwîn û hes- tîkên di nava şikâr û tibarekên bi ser hevûdin de pûnijî, rêz ne kirine. Ez nizanim ew çawa dîrok e, ew çawa coğrafya, ew çawa matematîk e. Ew çawa zanistî ye!.. Zanistiya xelk xapên e. Kifş e ku tiştêk ji jiyane kême. Ber bi tilekî ye. Nizanim ne ji awira min ya kême, nizanim ne ji aş û elema dilê min î perişan e. Cîhana gurover her dem bi tilekî, mîna kundirekî, mîna zebeşekî bê zibil, bê tavik, sexelî, şepola, mîna Şabikoyâ Êwertî ku di nava lerizand- inên felcoyî de dihejiya, li dora xwe dizîvire. Em bêjin kuloke ye, em bêjin kop e, em bêjin seqet û

şeht e, em bêjin qarçikî ye, em bêjin movik û karkarîka hestiyên  
zincîra pişta wî mîna Hemê Hêcî

ketiye ber, nikarê rabe ser xwe. Dema radibe qarên pê dikeve.

îcar îro, mîna Birahîmê Xerabqesrî, piştî mikewniya zêrîn, piştî  
keskûniya hewqas sal, bez û keda bêqedar, destdirêjiyên gund,  
navçe û bajaran, hewqas bûyer û pêhatî hatin serê wî, sewesî bû,  
destên xwe li kaba xwe didan, mîna Pepûkê xwe tewanbar didît.

Û di nava bêzariya heyho de digot:

-Tarê Birahîmo, heqê te li te nebû Birahîmo. Qey te wilo kir bavo!..

Birahîmo te çi bi serê xwe kir? Heqê te li te nebû Birahîmo.

Heqê te li te nebû Birahîmo!.. Tovê poşmaniyê şîn nabe!..

derfehatî, irkan re kirin st, hin Binxet kirin, hin koçber kirin, min ne  
tenê mala S'tj/T mala xwe jî wêran kir. Topa ku li serê Barê Xwê ber  
bi gund qirrika xwe dirêj kiribû, bê rawestandî diverîşiha. Topa din  
ku li Qelaçê Qijikê pelax bûbû, dema topa Barê Xwê radiwesta dest  
bi atâşê dikir. Her cara ku gur- mên bi newal û mesîlên dora gund  
diket, zar û zêçên gund, kal û xortên gund di nava remedîlka berê  
topê de winda dibû. Bi teqîna topê re miriyê Gorîstana Rastê  
dihilçenîn. Her cara ku dihilçenîn eniya wan li ferşê di ser serê wan  
re hatiye rûnandin diket. Darên behivên ku Emoyê Bavê Evdilezîz,  
bi rebenî, di nava xwehdana keşkulî û hejarî de, di nava kevir û  
kuçên dora rezê pişta Goristana Rastê, di nava kevirên ku jê nehat  
ji dilê erdê hilbike, wejêrê de çandibûn, ji buxza berê topan, ji dengê  
xurrêne mozoliyan, di nava qaşulê dirrihayî de qof bûn. Darên  
Behîvên Emoyê Bavê Evdilezîz û darên zemanî ku kes nizanê kengî,  
ji kîjan axirzemanî ve li Goristana Rastê hatine çandin, ji himmên û  
gurmêna berên topan, ji şîqe-şîqa mozoliyan qof bûne: Ew rojek ev  
rojek darên behîvan ku dora rezê Emo seranser sênc dikirin, darên

Goristana Rastê pišta xwe rast nekirin. Wilo qersifi, bêhn birehayî, kunêrî, qof man. Tirsax top û mozolîyên Osmaniyan ji dilê wan darên kerr û lal, bê semyan

demeket. Gundiyan hew dizanîbûn çî bikin, tenê qîr didan û hawareke bê hevî dikirin. Rê hatibûne girtin. Sê birrên piyade di pišta Rezê Diyarên re li gund zîvirîn û ketin navbera Taqa û gund. Bi armanca ku hawar ji Taqa û nava eşîrên Delmemika, Alik, Dorika, Zaxuran û heya bigihê Erebiya neyê. Riya bazdanê û riya hawarê qut kirin. Her du topan bi himmên û gummên agir bi ser

gund de difurandin. Ji Kolîkê, ji Beril ~ \*  
meterilyozan dilîliyand.

Mozolîya dilê min jî bi wan re dilorand.

dipelixandin. Ê ez li kêleka fermandarê Tirk rûniştîbûm. Di dewsa berê topên dewletê de kulîlkên mirinê vedikirin. Kulîlkên xwînê. Qîrên û hawar-hawarê jinan dihate guhên me, bavê Hiseynê hemnavî min, ku min digotiyê 'mamo' hate kuştin. Bûka wî Fatimê çû Piştî ku pismamên me ete riya çûn û nehat-

inê, berê topa ji neqabka Qijikê dane qesra min. Ez li kêleka qumandarê Roma Reş, bêdeng di nava gemariya xiyaretê de rawestiyayî... Li darî çavên min qesr û qonaxên min bi berê topan pelixandin. Ev jî bû xelata min û di nava xeftanekî qesebzêr de bifermoyî min dikirin. Xiyaret!... Heft borezanên li ser her du birçikên Qesrê, nalêniya xiyaretê bi şîqêna mozolîya dilê kurmî re diqîriyan. Hey gidî hawar!.. Barê giran ku ne bi avê tê şîştin, ne bi gotinan tê zelal kirin. Çiqasî dilê min bi qesr û qonaxên pismamin ku bi berê topan ji hevûdin dibedidîn xweş dibû, geş dibû, kulîlkên tolhildanê vedikirin, bi wêraniya qesr û qonaxên min hewqasî xemgîn û kelogirî dibû. Ew dilê ku aliyek jê kurmî bû, aliyek jê xwîn

bû. Bi berê topan re kulîlkên xwînê û poşmaniyâ vedikirin. Bi hevûdin re, kulîlkên dilcoşî û xemgîniyê, kulîlkên reşbînî û ronbîniyê bi hevûdin re bel dibûn. Pelên kulîlkên ku bi barûd û risasê bi ser hevûdin de kutayî reng vedidan, mîna miştaxa mewîjên Evdellayê Mala Zimo, li ser axa sor, ji xwe re diçilmisîn. Şewt bi hinavên min de dihilpirikîn. Pêt û rimiya agirê kûra cêrkerên Batê bi ser dîlkê min diket û girîzokên dijwar êrîş dikirin nava mêjiyê min. Hêstirên zuwa ku di nava afzendaqa cewherî de ber bi serê xencera Isa Begî diherikî, bi ser hinarkên rûwê min de dibûne şelî-pan. Lê çi!.. Qey min dikarîbû deng bikim. Min xwe dikuşt, wan ez dikuştim.

Me çiya dabûne ber xwe.

Me berfa di nava xeftanê dilê çiyar de veşartî dabû ber xwe.

U di nava mista gundî û cîranan de navê min hate nivîsandin, ji bîr nakin. Qet ji bîr nakin...

Xezebo!..

Roma Reş xezeb dibarand, ez diberre

Kotîti ji erd û ezmanan dibarî!..

Roja pêşî ez teslîm bûbûm. Dilkurmîti bi kêrî min ne dihat. Xêr ne dikir! Qolincên poşmaniyê qeremên min bişikandane jî, xêr ne dikir. Kê dîtiye ku sitirihê poşmanan hatine. Eger sitirihê poşmanan hatibana, roja gonê ku Mistefa Kemal Paşa li devê dergehê Qesra Waliyê Amedê, li neydanka navbera qesrê û Mizgefta Welî, ew gotinên ku gotin min û heya îro quloçên min di atmosfera cîhanê de ne dihilatin. Xecxecokên qui û qewêran wî di nava movikên quloçên min de hêlînên xwe çêbikin û dîlokên dilojarê bixwînin. Kesî ne diye ku sitirihê poşmanan çêbûne. Kesî ne diye birazî!.. Kes bi dilê kesî nizane, kes di kul û derdê kesî nagihîie.

Binêr, ev çend saet in di binya diyarê Hopê de, ez û tu bi hevûdin re ne. Rêwingiyên din, ji kêleka minîbusê dur nakevin. Geh minîbusê daf didin, geh keviran didine ber dolabên wê ku paş de neçe. Şifâr ketiye nava heyreke mezin, hew dizanê çi bike. Wilo xuya dike ku tiştêkî ji motor fam nake. Li xwe danayîne. Lê wê çi bike, kesî din ku ji wî baştir ji motora trimbêlê fam bike nîne. Mîna navê xwe pê dizanim ku tenê ji derve motor dîtiye. Xwe xeşîm nake, hostahiya xwe nîşanî rêwingiyên dide, ferman li duv fermana din dide wan. Ha daf bidin, ha kevir bidin ber dolabên wê. Hesine, ku sar bû bav jê re nine. Hesin dive germ bibe, av bibe, bistewiye, da xal bide. Dema tîr û kevan bûn, mêrî çê dest dihiland; dema hesin derket, şûr û mertal dest pê kir, hinekî baş bû mêran dikarîbû hêl û himmeta zend û bendên xwe nîşan bidin. Dema hesinê bi qû derket mêrxasî kete pişta kevir û kûçan. Hesin! Makîne!.. Sekih û siddan!.. Sazî û dezgeh!.. Tacîdarê demê ne. Dêhnê xwe bide şifêr!.. Minîbus ya wî ye!.. Asil ew e. Na!.. Na, birazî na, ne asil ew e. Asil makîne ye. Makîne emir dide, ne ew. Makîne tacîdarê demê û civakê ye. Me çi fikir, em bi nav ser û çavên nevûdin diketin. Eşraf û paşazade û xwendekar ji xelkê derdiketin, me mala Osman berê xwe da hevûdin, xaniyê kesî ji me li bajarekî nîne. Ku me hewl dabane mal û mewdan, me bala xwe ne berdabane pîlaxê bajaran, belkî hingî berê me, xwe bi xwe neketane hemberî hevûdin, dewletê jî destên xwe dirêjî nava me ne fikir. Li pîlaxê bajarekî, li guhê taxekê ji yê Midyadê, ji yê Nisêbînê... Hingî, wî berê me bikevê rêbûwariya hemdemî. Bajar qonaxên rêwingîtiya hemdemî ne, qonaxên têkiliya bi derve re ne. Şar û şaristanî... Tacîdarên paşerojan in. Me ji destên xwe berda... Binêr, bela me li we zarokên me jî dikeve. Rê li ber me hate girtin, kesî ji me devê pirtûkekê venekir, devê defterekê



venekir, bi qelemê xêzik li kaxezekê neda... Em kor man, kenû ku dengan dike, lê nizanê çi dibêjin, man. Korê dinêre, lê na bîne. Korên bi çav, kerrên bi guh... Ne dibînin, ne deng dikan... Bavé min ji dewletê re kir. Xayintî li pismamên xwe, li hemwelatîyên xwe kir. Xêr ji xwe ne dît. Destê dewletê girt, hogir û mêrxasên mala bavé xwe dane kuştin, dawî dewletê destên xwe kirin xenîqa wî.

Dewletê karê xwe pê kir, Tora Hevêriya pê safî kir, û piştî fer-mana wî rakir. Roma reş, ewletî pê nabe...

Lê çi, min jê kambaxtir kir. Min kuştîyö bavé xwe neanî ber çavên xwe, bi degeliyeke mêrkujî destên xwe avêtin destên dewletê. Min, ha ha, ha ha 'nefiram' rakir û hemberî serîhildanên Kurdan şer kir. Tora Hevêriya bû du şiq. Şiqek jê helikîn, ber ba û bahoza kafûrî ketin, di nava xwîna netewparêziyê de xeniqîn. Şic~ din em bûn, li herêmê bi navê Roma Reş bûbûne dewleteke xezt barîn. Bîreke bê av, ku kesî nikarîbû avê jê bihince.

Di dilê hemberên me de, ku dewlet raçavî xwe kiribûn, armanc û meremên mezin hebûn. Lêbelê dijmin, ji wan mezintir diramî. Mêjiyê di serê wan de, avşolka di qaqilkê serê wan de, rîx û pişkulan bizinan, weqiya hiriya mâşinan, behîvên Mala Ezîzê Emo, miriyên di Goristana Rastê de, di hejmartin. Xiş û hesabên xwe li ser kaxezan, bi awayekî zanistî û polîtîk li ber wan bûn. Mêjiyê serê dijminê me her du basikan, hesin, risas û maden, coxrafya û matem-atik, fizik û kimya, dîrok û tacîdarî hesab dikirim Di navbera serê me her du basikan de cudatî ev bû. Em her du basik bin ketin, dijmin serket. Ya me bi xwe bi heyho ketiye. Cihê me di nava civakê de nema. Navekî qirêjî li ser eniya me nivîsiye. Ew navê ku bi xwînê hatiye nivîsandin, nayê xera kirin. Lewra kezeba me her- hilê ye, serê me di nava heval û hogiran de nikûbî ye, dilê me di nava dilê heval û

hogiran de xumihayî ye. Ne nêre, em serê xwe ji kesî re danayînin û kesî di ser xwe re qebûl nakin. Lê, her kes li pêşiya me ye. Em palê xelkê ne. Em loda bêndera xelkê didêrin. Me ji bav û kalan de bêndera xwe ber bi ba ne kiriye. Dêhnê xwe bide derdoran, çî me mina xelkê heye. Rez û werzê gundiyan ji yên me bêhtirin. Pez û dewarên xelkê ji yên me bêhtirin. Ew gundiyan ku me ji derdoran anîne... Ew gundiyan ku palûta me dikirin, ji bo me diberizîne hevûdin, bi bend û berberi dihatin hemberî hevûdin, serê hevûdin dişikandin, ji me dewlemendtirin. Çî me heye? Navekî qaçilkê dara pûçelaxî... Navekî gincirî... Hewce nîne ku em li ser dilkê xwe bibirin û bêjin em serê eşîran in. Xelet e!.. Şaş e!.. Em têk çune. Pêşiyên gotiye, xwediyê miriya kor in. Icar em in mirî û xwediyê me jî kor in. Icar kor em in, ku miriyên xwe nabînin. Binyat û bîneyetiya me kor bû, heya ku em jî kor mezin bûne.

Ku bînatî kor be, binyat wêran be paşeroj nînin, xeramalî ye. Tevgerêke bê wate!.. Lept û livandineke bê armanc.

Bez û lezeke bê dunde.

Dema bavê min girtin ez zarok bûm. Ji nişkê de, piştî ku ; ji wan re kir, rêzaniya wan kir, Elîkê Betê ku quloçên wî ji binya Sêrtê digihane binya Mêrdînê ji wân re kire çêlkewê çengo kirî, girtin. Pêşiya wan safî kir, kes li meydana ne hişt. Roja ku Elîk li banê Bêrma Mizîzexê xwe çend kire nav ser û guhên bavê min û heya roja gonê, ku Osmaniyan 'nefiram rakir û bire ser, serê xwe ji wan re nedanî. Kelem û tujikê çavê Osmaniyan bû. Bîst, sih salî tiving ji milên wî neket û aramî neda Osmaniyan, ku li Tora Hevêriya bêjin em xwedî bandor in. Osmaniyan li Çiyayê Hevêriya ne dikarîbûn bac û bêşê serrast bidin hev û ne dikarîbûn neferekî xwe bişînin herême. Elîk qopanî distand. Ku ji nişkê de bavê min girtin, bar ma li ser milên

dayika reben. Sal 1918... Haco eşîr li dora xwe dane hev û hemberî Osmanîyan dest bi şer kir. Kete gundê Taqa û pişta xwe da çiyayên Tora Hevêriya ku ber bi Mava dirêj dibin. Sunda qesem li canê xwe da û got, yan ezê bi riya bavê xwe de biçim, yan ez nahêlim ku lingê Osmanîyan li herêmê sefik bigire. Şer giran bû, Osmanîyan 'nefiram' rakir, çîq di Haco û berşanê wî nekirin. Bavê min bi dewletê re bû. Car din bi Haco û topa Hevêriya nikarîbûn. Bavê min, ji bo hawara dewletê giran bibe, gote fermanîdar: 'Eger hawarji Sêrtê bi me ve ne gihê, em çîqê di Haco û Hevêriya nakin. Selhê jî kete destên wan, şev nîvê şevê, Osmanê Mehmudê qas zîlamên xwe dane dora xwe û avêtin ser Selhê, Helex ne bes bû Selhê jî zemt kirin, ku hawara giran neyê! Esker ji Sêrtê xurriha hat. Kulihê bejik bû, giha kû kurisand, giha kuderê du danî, giha kuderê ocax tefandin; erd û ezman, jin û dot tengezar kirin. Bêhna goştâ mirovan, dengê qîrên û bêzarî, axêna dîlzariya komên xelkê di nava buxziya dirrindeyî de, li ber sintaqa singoyan diweliya. Eskerê Sêrtê kete gundê Selhê û berê xwe da Helexê. Tişteki kambax û kirêt bi serê gundiyên Helexê de anîn.

biçime nava zarokên gundiyan, pêlstikurî li min dikirin. Şevân Biharî, şevên Havînî, zarok ku damistonka xwe nebe, agirê şevîniyê geş neke, nikarê di nava koma zarokan û lîstika şevê de cih bigire.

Damistonka min nebû.

Heya niha jî ez bê damistonka jiyane me. Dest li ser damistonka xelkê dideynim, weke para xwe diavêjim ser agir, agirê sotîkirinê gurrî dikim.

Ew şevên ku min nikarîbû damistonkê peyda bikim, ji min re bûne bîrewerî, ku ez bilitik bûm, min pêlstikurî li zarokan kir. Heya îro jî

ew milkulî ji dilê min demeketiye. Bûye weke kunêrekê di ser dilê min de runiştîye û her ez damistonkê dixwazim. Kesê ku damistonkê neyîne ser agirê min û geş neke, biçê sed salî ji destên min nanicinîne.

Cotbariya me, her diçû qels dibû. Salé carekê diduwan dayika reben bi nava eşîran diket, berê salé di kulînê de li ser hev fikir, lê tevgera cîhanê tenê bi xwarin û vexwarinê qîm nake. Ji bo ku mirov di nava tevgera civakê de bibe xwedî cihekî bi rûmet, hinek xislet û pêdiviyên kirinê hene. Dayika min, her şev, piştî şîva, ez li ber kaba xwe dirunandim û di gihên min de diqulquland. Digot, ha digot. Ev kesê han dost e, ewlatî pê dibe, yê han dilsoz e... Filankes dijmin e, piştî xwe jê re veneke. Yê han evîndarê malê cîhanê ye, li ber malê xwe miriye... Digot ha digot!.. Şîret li duv şîreta din, yeko yeko darvedikir, bi guhên min ve bizmar fikir.

Çingênî ji bizmarên di guhên min de tên.

Lêbelê yek gotina wê, ji bêndera wan gotinan teva, yek gotin di serê min de cih girt û di salên dirêj de, ji bîra min neçû.

Digot:

-Zu bi zu derba xwe daneyîne. Ku te got, bihêle, rawestîne, li hemberên xwe binêre, gotina xwe haveyn bike, bi meyîne, tirş bike, paşkâ... Roja derba te hat, teqepaşiyâ nediyê. Bila derba te himandî be. Ku te danî, bihêle ku deng jê were. Her dem darbê biavêje kêleka mêrê çê, yekî ku nikaribe li tola xwe bigere. Tê wî kesê pîs, neçar û mirdar ji holê rake, yê qenc jî çavtirsandî bibe.

Dayika bêçare, qet bîr nedibir ku mina her tiştî dostanî jî kevin dibe. Tenêbûn zor e!..

Tunebûn jê zortir e!..

Hejariyê li ser sîwana dergehê hewşa zemanî hêlîna xwe Pismamên me, ku me bi dewletê re hevkarî kir û em ketibûne pêsîra wan, med standibûn. Kêmasiya wan ew bû ku her dem dijî Osmaniyan û piştê hemberî Îttîhadiyan derdiketin û dijî wan şer dikirim Ji xwe piştî ku Haco rabû, li ku derê Kurdan deng derx- istibane, ew li wir bû. Tebata wî ne dihat. Geh bi Amedê re, geh bi Rewanduzê re, geh bi Mêrdînê re, têkildar bû...

Çend sal di wê navberê re bûrîn, ez blitik bûm û min hêdî hêdî destê xwe avête qundaxa tivingê. Wilo sîpekî, hin bi kûbarî, hin ji pêdivî min rahişte tivingê. Lib-lib; dostên kevin, eğer riya xwe şaş dikirin, eger ji dilxwazî bi ter me de dihatin. Ji min re çardehê Nîsanê bû. Dergehê dewletê ji min re vekirî bû. Ew pismamên min... Ku bavê min destên xwe ji pêsîra wan venekir, dijî dewletê şer dikirin. Yek carê bi tenê, ava wan û dewletê di yek cokê de ne herikî. Dewlet û ew mina pişik û mişk li ber hevûdin veketîbûn.

Sal 1925. Şex Seid dest bi şer kir. Teverger kete nava Tora Hevêriya. Mala Osman, ha li vir ketin, ha li dera din, hedanî nekete canê wan. Ferezende ketibû meydanê ji min re. Dewlet, li kesa digeriya ku bike heval û hogir ji xwe re, di tengasiyê de bû, çek didan, pere didan. Ji bo min, ji bo mirovekî mina min, ku nû dest pê kiriye, çavên wî li tacîdariyê ye, ferezende bû. Ez li ber viran bûm ku dikaribim lingên xwe dirêj bikim. Lê gereke min, pêşî der- dorên xwe oxilme bikirane. Ew dostên kevin ku dihatin mala me, min çendek ji wan ceribandin. Amade bûn. Piştî çendekî min çen- dek ji wan dane dora xwe û berê xwe da Midyadê. Ez hatim mala dost û yarê roja qewamê Gebroyê îsayê Zetê. îsayê bavê wî dostê bavê min bû. Gebro bi devik bû, Tirkî dizanîbû, min ew da pêşiya xwe û qista Sara Hikumetê kir.

Ew rojek, ev rojek ez û dewlet hevalbendê hev in. Ez sergom jî kirim, Sadun Beg ku li Burdur, wargehê sergomiya min rastiya min bû, ez şiyar kirim, pişti ez vegeriyam ji bira min çû, min car din destê dewletê bameda. Heya weke roja îro.

Mistefa Kemal Paşa ku li Amedê ew bêêrzî da min û guwê di devê xwe de zerki devê min kir, dilê min şikand. Car din min newêrabû destên dewletê berbidim û xwe bişemirînim, piştî xwe ji Kurdan re vekim. Min gelek kiribû û dewlet piştgirekî berz û mezin bû. Pêpelûk û payendeka tacîdariya min dewlet bû. Barê tirsê giran e.

Dema min tiving dida milên xwe boriya wê li erdê diket, ku min berê lula wê dida jor, qundax li erdê diket. Tivinga min mina darê tenurê di destên min de bû. Ku rê dur ba ne, zilamekî min dirahişte tivinga min. Ez diçûme ku derê çend zilam bi min re hebûn. Ez ji dema Hingêlyo û Tuştâ, nû nû xelas dibûm. Min dest bi lîstika xar û kaban dikir. Dengê dayika min î reben ku xêr ne ji ciwaniya xwe dît, ne ji kalîtiya xwe, ji ser min dihate hilandin. Hin bi hin derdo- ran navê min hildida û digotin; 'çik ji vî kurî diçe, wê dewsa bavê xwe bigire'. Erêêê, erê!.. Hew min dît ku ez di nava agir de diley- izim. Pêşî balkaş bû û dilcoşî dida min, mîna lîstika zarokan dihat. Ez biçûkê ku ji nişkê de mezin bûbûm. Mezinahiyeke ku bi sertac û tacîdarî, ferman û destûr ji min derdiketin.

Roja ku min Gebroyê îsayê Zetê da pîşîya xwe û çûme daîra qeymeqam jî, min bawer ne dikir ku barê jiyane tîr xapînok û hewqasî giran e. Mîna lîstika benderên gund, hêsa, tîr metrozî, tîr yarî dihat.

Dewlet!..

Dewlet aşüfte ye!..

Bêjiyê piştî bavê ye, bext û bêbextî li cem wek hev e.

Dema pêdiviya wê bi te hebe, xwe li ber te zirav dike, şahîk dike, xweşik dike, xwe li ber te vedike; dema karê xwe bi te xelas kir, mîn mare pêvedanê li te dizîvire. Hêstira şemûs e, ne tu dikare li pêçiyê biçe, ne tu dikare li duv bimeşe...

Destpêk kengî bû, çawa çê bû nizanim, hew min dît ku çend miro li dora min peyda bûne û gotin filankes miriye em biçin serxwe, wan, filankes ji girtîgehê derketiye em biçine serdana wî, fil dostê bavê te ye em biçine dilxweşiya wî. Lîstika bi zarokan re, ka xar û kaban ku li serê bana dilîstin di dilê min de ma. Biçûkê mezin, ku ji ley istikan têr nebûbe... Her cara ku min didît ku zarok dileyizin û berê min li deverekê ye, eşeke têr qolincî dikete ser dilê min.

Êdî ez li pêşiya xelkê bûm. Hesabên min kete nava hesaban. Mêrxasên min çêbûn. Xortekî ku di tenga xwe de be, xortekî ku nû pêketî be û xwe serkêş û tacîdar bibîne.



Zarokekî ku zu mezin bibe, ne zarokatiyê dijî, ne xortaniya kelogermî, ne evîna anîşk û devê deriyên nependî dibîne.

Ev dused sal in... Roja ku Silko kete nava hêrik û şikêrên Zaxuran, qesrikên hişkeber ava kirin, heya îro, bayê dijî Tirkan da bizavtin. Serê xwe ne kirin ciherê dewletê, pêşî bi mîrekan re serê xwe rakirin, piştî ku mîr û mîrzadeyên Kurdan tertûbela kirin, wan rahişte darê rimé, xweser, doza Kurdan meşandin. Dused sal!.. Du sed sal in ku Malbata Osman û dewleta Tirk li hevûdin dixin. Êdî ez, mirovekî biyanî bûm, ez bixwe nemabûm ji Malbata Osman, ez kurê dewletê bûm. Malbata Osman pîkol dikir û coxrafya xwe, heya tu bêjê bes fereh kiribûn. Her roja diçû bêhtirîn sehwa wan çêdibû. Osmaniyan ji Malbata Osman dipelikandin, ew heft-heşt bav bûn ku hemberî Osmaniyan şer dikirim Nifş li pey nifşâ din hemberî

Osmaniyan û hemberî Komara Tirkiyê şerâ xwe domandin. Yek dihate kuştin yê din dest pê dikir. Ew dihate kuştin yê din... Heya îro wilo didome.

Serhişkiya wan bikêrî min dihat. Her gava wan ku hemberî dewletê diavêtin, şer dikirin, ez di çavên dewletê de şêrîn û mezin dikirim. Agirê di navbera Osmanî û Mala Osman de her û her gurrî bû. Dem dema agir korîk dibû, min geş dikir. Li hesabê min dihat. Ez dibûme xwedî paye. Eger dewlet û hemberê min neketane zîqa hev, tacîdariya min têk diçû. Min riya xwe nas kiribû. U kuştina bavê min bi destê hevkarên min derseke mezin dabû min.

Or

Ku kevir û heste li hevûdin ket, agir çirisî, tirr û hişk bi hevûdin re dişewitin.

Dewleta ku li ser sê kîşweran pelax bûbû û serî zuwa diqusandin, di nava çiyayên Tora Hevêriya de ketibû nava gevzeka bêzariyê. Dikir û ne dikir serê Mala Osman ne ditewand. Roja ku Haco II. ji Çiyayê Mava, bi xap û rîpan daxistin û serê wî jê kirin, li ser cifniya zîvî kirin, pêşî birin 'muteserifiya' Sêrtê, piştî birin Stembolê, wan digot me ev cih û war safî kir. Elîk rabû xerabtir ji marné xwe kir. Hé Elîk safî ne kiribûn, Haco III. yê pişt bav, ku navê bavê wî lé kirin rabû, Hiseynê hemnavê min, qarîşa reş, aqilmendê her du cîhanan rabû dest pê kir, her kesî ji dehma xwe de, destên xwe palandin. Osmaniyan nêrî ku çîqê di wan nake.

Agirê Tora Hevêriya çiya ji hev dur kirin.

Deşt û newal ji hevûdin dur kirin.

Agir fereh dibû... Tovê waweylê fereh dibû...

Mirin fereh dibû... Sînorê navbera dilan fereh dibû...



U Çiyarêzên Tora Hevêriya pêşîra xwe vekir, govend germ bû. Agirê serîhildanê gûrî bû. Çiya, deşt, newal û gelî, nizar û beroj teva di nava gir de leyistin. Stêrikên di stanê asûmanê şînxalî de korîk bûn, mêrên simbêl kaytan di nava xwîna bê hesab de gevizîn. Qîr û qiyamet bû... Çiyarêzên Tora Hevêriya tucaran xwe tenê ne dîtine. Çiyarêzên Torê bi hingil û zengil in. Bilind in, xwedî gelî û newalên kûr in. Serê wan bê mij û moran nabe. Sebra çiyarêzên Tora Hevêriya bê qerqêşûn û lîie-lîla mozolîyan naye. Wargehên star û ewlekariyê ne. Bayê pêşîr qetandî, daw çirandî, deling vekirî li mesîl û guherkan bi lotîk û zîtirk dileyize. Bêhneke zelal ku têh- nik û hilma mirovan tewqeyî nedaye ji mesîl û guherkên çiyarêzan difûre. Navê çarenûsiyê ne. Xwe tenê nedîtine û nikarin bê mirov û lawirên kerrende bijîn. Dayika çilûheft guhanî ye. Çilûheft guhanên şîre jîyanê didoşin, haveyn û firşike mirovaniyê didoşin. Çilûheft çavkanî, çilûheft dirr, çilûheft bilûrên ku bi berbangê re pif dikine dilê jîyanê ne. Fira Kevoka Spî û dengê peşî yê Nuh in ku li serê Cudî dilpenahiya xwe hemberî Yezdan qîriyaye. B; çavkanî û nawîskên xwedêdayî, bi darmêwe û rengîniya gulîstanê xemilandî ne. Helbestên bê nav, li vir têne xwendin, destanên dûr û dirêj, mêrxasî û dilojarê di nava hunandina wan de ces û kevirê rêzê ne, stranên evînê li wir mil dispêrine hev. Leylan û dîloken gulbijêrkan, li gelî û mesîlên bi kevir û kûçan caris bûne, di nava rizde û şikêrên zemanî de reng vedidin. Coxrafya zîv û zt - û dirr e. Cewherê yekemîn axaftinê, qîrêna yekemîn ya nêçîrê, li gastîn û qelaçên wir derketin meydanê. Keliha bi bircik, nawîsk û bê dergih e. Comerdiyêke mezin ku dibin stuna ezman de nav lê nehatiye danîn e. Barana ku bi ser çiyarêzêr Tora Hevêriya de dibare, dewsa xwe li ser pelê daran

nahêlin. Lê, roj dewsa tîrêjên xwe li ser pelé daran û rûdêna axê dihêle.

lirtûkan de hîna nehatiye nivîsandin xêz

## RÎTALO Û FIKA LI BER MIN VEBÛYÎ

Géra striya bi me dikirin birazî...

Cewherê dil di nava pîkola gevzekî de dişikandin, her cara den g' xwe li me dikirin, her cara bi ser me de diweliyan, hêrsa xwe me didan, tişteki me ber bi hevûdin ve ne dihiştin; ji zar û zêç, ji mal û mewdan, ji dil û hinav, parçe parçe, şikestî, tovê waweylê, ternir ternir dikirin.

Weke Birahîmê Gewrê û sala gonê, li benderka Newala Telîçanê... Géra striya bi me dikirin.

Birahîmê Gewrê mahkûm bû. Berberî ketibû gundê Pîrkanê; gilî, berz û pevçûn, gelacî, xap û rîpên rojane, gundî kişûmat, zarok jî di nav de, ku hew dikarîbûn li serê tingên gund bi îç û zextan, tevşo, holê û çirrê bi hevûdin re bileyizin, ji ber hevûdin pekandibûn. Dijberên Birahîmê Gewrê gilî kirin, tenê hiştin, ji gund kirin der. Bazdayî bû. Rojekê ji wan rojên ku di nava germa Havînî de semi- tî, agir ji erd û ezman difûriya, şazîbamoya Birahîm di destên wî de, li benderka Newala Telîçanê tîqe tîqe liqasî hemberên xwe dibe. Silêmanê Evdê, xwedê giravê xalê wî ye, Eh ni cd ê Elîk, Mihemedê Erefêt, Emerê Aso û Mihemedê Xelefk... Piştî ku Birahîmê Gewrê di nava xeftanê bêzariya tenê de hiştine, giliyê wî li deristana hikûmetê kirine, mahkûm kirine, ew çend mirovên han serkêşiya gund dikin û rêza Mala Hemkê ne. Wê rojê, kîm-kîma Havînî, çîq-çîqa nava rojê pêl dilê Hesenê Simayîl dikin û diçine Mala Hemkê. Li

vegerê, çima Birahîmê Gewrê liqasî wan nabe. Tîqe tîqe, çawa gihane bênderka Newala Telîşanê, Birahîmê Gewrê devê şazîbarno dirêjî wan kir, silme lê zîvirand, fişek ajote devê wê, dengê xwe li wan kir, her pêne mêrên li ser navika xwe dibirîn ji çek kirin.

Destên wan li pişt quna wan li ser hev danîn, bi rêzê, mina dewara ser diraxê girêdan. Bi destên xwe, eğer şekal bûn, eger çarox bûn, eger gizlewêtên lastîkî bûn, ji piyên wan kirin, goreyên wan di ser teliyên wan re anîn, pêxwas birin bêderkê. Bi wan derdoran ket, strî, gutînên hişk ku di nava strîkên hûrik î bizmarî de xemilî bûn, ji derdoran ber hev kirin, mîna diraxê raxistin. Ber bi deviyêke talanî beziya şiveke ji vayê ku jê dizane, bitir, bê movik, mîna şitla yek salî, ji quntara qurmekî kevnare jê kir, çilo û çaxikên rota şivî peritand û bi radorî canê wan ket. Dema mêran bi xwe nexweş dikilin, devê şazîbemo dirêjî wan dikir. Her pêne mirovên dîl ketî, Birahîmê Gewrê xweş nas dikirin ku ne dizanê yarî çî ne, ne dizanê şermî û tirs çî ye. Biya wî nekin wê her pênean rêz bike, yek fişekê bi tenê li ser wan deyne ku her pênean bisime, bi ser hevûdin de bike şikâr. Bi rotê û devê şazîbamo pêne mêrên pêxwas, mîna dewaran ajotin ser diraxa strî û gutînên strî bizmarî. Silêmanê Evdê, xwedê giravê xalê Birahîm, carinan dewsa xwe ji ser striyan diçinî, Birahîm rota tîr di der quna wî re dikişand û dengê xwe lê dikir: ‘Dizemim ku Silêmanê Evdê ne yê serşivê ye, lê ku ez wî dibinî de girêbidim, xelkê bêje Birahîmê Gewrê cudatî xiste navbera xalê xwe û gundiyên xwe.’ Heya himmet û hêz tê de hebû rot di der quna xalê xwe re dikişand û digot: ‘Diraxê bela neke.’ Heya ku strî û gutînên strî bizmarî, teva bi wan gère kirin, her yekî qundaxek didu li nav milên wan dan, ew qun rimî kirin û berdan.

)ewletê géra striya bi me dikir.

Çawa dixwestin, weke dilê xwe dikirin. Qîma wan dihat ez, qîma wan dihat pismamên min dikirin serşivâ. Pêxwas li ser diraxa striyan gère bi me dikirin.

Sala gonê ku cendirman ez birîndar kirim, ne bi tuwî, ji nişkâ de avêtin ser mala me, bê virde wirde, gotinek rizî tenê ji nava lêvên wan î xwînmij demeket, ez gittim, destên min li ser hev kirin û birim sergomê. Geh bi suwarî geh peyatî ez şibaq kirim û berê min dane Anatolya, bajarê Burdurê. Şevêkê ez li Entabê rawestandim, min hêvî ji wan kir, bi zimanekî ter lave xwe dexîlî fermanî kir, ku destura min bide, biçim devê girtîgehê bavê xwe bibînim, ne hişt. Bi lingê seqet û dilekî şikestî û birîndar ji Entabê bi rê ketin. Ya rastî stêrikên ezmanê dilê min di nava valahiyeke bi tenê de diçilmisîn. Ezî çî bikim, girtiyê Roma Reş bûm, mîna gelek kure- bavan berê min li rîyeke dûr ku ne min dîtiye, ne min bînaye bû.

Dewlet ne hêsa ye...

Berê di çîrok û çîvanokan de mijara dêw û ejderhayên du serî s~ serî dikirin. Dewlet dêwê heft serî ye, tu li seriyekî dixê, yê din hemberî te derdikeve, tu wî jî jê dike yekî din derdikeve hemberî te.

Ji bo mirov dikaribe dêwê heft serî ku cewherê dilê mirov di nava pîkola gevezekî de parçe dike, gurz û mertalê Rastemî Zm, suwariya Rexşa Belek, hewn û hişmendîya Cemşîde Kal gerek e... Ji bo hawar û gaziyan Şevrev ku hêlîna xwe li ser perr ûrbaskên bayê kûr çêkiriye gerek e... Ku mirov dikaribe li dora dêwê heft serî pîkola xwîn tewrênêkî, ta û bayê têr tevzînok û qolincî bike. Pismamên min çend perutkên ku nizanîbûn silma tivingê çawa dizîvire, ji kelhoşka dilê xwe bêzar, dabûne abra xwe, dixwestin dijî dêwê heft serî şer bikin. Y a rastî, min qîm ne dikir, dêwê heft serî ji bo min hêz bû, min dixwest ku di ber hinbêza dêwê mîjok de, tacîdariyê bikim. Qet

min nizanîbû ku dêw her dem xwarinê dixwaze, dema alif û êm ji ber xelas dibe devê xwe li dora xwe dipalîne. Êm û alifê li derdora wî ez û kesên mîna min bûn. Pêştir ji min... Piştî pis-mamên min qurpandin, dora gundiyan hat, ew jî ji ser kok û qurmê wan qurmiçandin, dora min dihat. Jiyan wiha ye... Eger tu li jiyane xwedî dernekeve, cewherê dilê jiyane bi cewherê dilê te re diçilmise, rêtaî nade.

Mirina me, mezin bûn û berz bûna dêw bû.

Em dimirin, dêw mezin dibû.

Dêwê ku li ser gorîstanan têhnika jiyane distîne, ji xwîn, goşt û hestiyên mirovan dipişkive, li ser bedena kêşî û girîşan laşan bilind dibe. Gorîstan çiqasî gelek bin, dêw hewqasî mezin e.

Kurdistan wargehê gorîstanan e...

Û dewlet, ew debdebe û hûnandina bi kerkî û mîzoka bi ta, nex û hevrîşme bi dest, xwehdan û ronahiya çavên mirovan li ser teşîya rebeniyê hatiye ristîn, bi morîk û hêstirên çavan tene darvekirin, li ser tevna dilê evîndar tê raxistin û di nava kezî û biskên keçikên bê miraz de, bi sebir û 'qahu medet, ahu medet' hatiye hunandin li ser stana dil û mêjiyê me pelax bûbû.

Dewlet, tiştS ku mirov dixewna xwe de na bîne, ew dijî. Kûr û dûr lêdixe. Kûr û dûr dirame. Bi saya Kurdan gelek tişt safî kirin. Gorîstanên dora Geliyê Çanaqalê Kurd in. Gorîstanên dora Hezeromê, dora Muşû, heya bigihe çolîstanên kûraya dilê Erebaştanê wilo... Te qet dêhnê xwe daye stana Kurdistanê, wê pêgiha bi gorîstanên kêl şikestî, tenê li gastînan mayî, bê kes û kûs, gundên dora wan wêran bûyî, kaviil bûyî, xemilandiye. Min maf dida pismamên xwe, piştî ez ji Entabê, bêyî bavê xwe ziyaret bikim, şibaq kirim û birim, min ehd li canê xwe dida, bi dijiwariyeke bê qedar li

ser navika xwe dibirî ku ez destên dewletê negirim. Dijî Roma Reş ku di nava kirasê kafirîstanî de nêzîkî mirovan dibe, bext û ol pê re nîne, şer bikim. Kî çi dibêje, kî ziman dirêjîyan dike, striya bi destên min diçine, ezê tola xwe, tola bavê xwe ji van qeşmerên ku cîhan û jîyan bi hevûdin re lewitandine hilînim. Tenê Elîk, Elîkê ku quloçên wî di çiyarêzên Hevêriya derbas dibûn digi- hane Pencînarê, digihane nava Omeriyan, digihane binya Mêrdînê û qopanî dida hev, ji heqî wan derdiket û bi radorî canê wan diket. Ew nas kiribûn. Ji xwe piştî ku ji Xerpêtê vejeriya ew Elîkê kereşivan çûbû, yekî din hatibû. Sala Fermana Filehan, ku Filehên me dibêjin Seyfo, civînek li Estilê çêkirin. Bangî qas girgirekên derdoran kirin. Osmaniyan got 'Filleh dijminatîya dewletê dikin, têkiliya wan bi dewletên gawuran re heye, mina Ermeniyan emê fermana wan rakin û cih warê wan, wê ji we re bimîne.' Elîk, berî her kesî rabû ser xwe û lingê xwe li erdê da, bi ser rayedarên Osmaniyan hilbû: 'Ez qebûl nakim ku kes destên xwe dirêjî Suryaniyan bike. Çend perutkê ku di nava me de mane, çavên we lêye ku hun wan bikujin. Raîmannelleh ku dewlet be jî, mirovê ku li siha wan binêre, ezê sed bavî ji wan çêbikim.' Weke kewê ribat xwend û li devê derî da derket. Osmaniyan nêrî ku nikarin Elîk razî bikin. Çilo kirin çawa kirin, şeş serkâşdn Mala Osman girtin û berê wan dane Xerpotê.

Roma Reş ne kurê bavê kesî ye.

Bilî xwe nabe evîndarê çavên tukesî. Qet!..

Çawa Haco û hevalbendên wî hatin terqandin, dewletê dest li ser girgirekên Midyadê danî, teva di odeka di ser lîwanka Bêrma Midyadê de kom kirin, deriyê hesinî li ber wan kilît kir. Sadetînê Keçel jî bi sîxurî kire nav wan, ji bo heval û hogirên Haco kifş bike. Dawî mirovên mîna Mihemed Şerife Nehroz, sergomî dora geliyê

Çeneqela kirin. Jiyana min ya sergomiyê, bi serê xwe romaneke ne nivîsî, ne bihîzî ye. Her roj, weke ferza limêja xwedê, her roja xwedê tê biçe qereqolê xwe şanî wan bide, dibin awirên zexel, dibin gotin û awira pêlstikuriyê de îmza xwe biavêje... Her roja xwedê mîna limêja deynê 'ezel ebed' di nava bixêrhatineke hişk zuwa de... Her roja xwedê, di aynî saetê de, teqeze, divê tu li wir be. Du pêhatî bi tenê, li welatê ku ne me bi zimanê wan, ne bi toi û toreyên wan dizanîbû, bi bapeşka dilkulî ez ji erda xwedê xistim. Roja ku ez û hevlekî di nava xeftanê yek çarenûsiyê de, li devê dikana pêlavan, liqasî hevûdin hatin û li ser masa qahwexaneyekê ji wan rûniştin, jina qereçî qajikê devê xwe, weke çêleka Şerabya ku kayîna xwe dike dicht, devê xwe bostekê ji hevûdin vedikir, her du arguşkên xwe bi çeqçeqonkî bi ser hev de didewisandin, hat û sê pol û kabekî anîşk şikestî avêtin ser masa me, piştî xwe çend kire destên min, li kefa mista min nêrî, çavên şerbitî bi ser min de pêl kirin û got: 'Axam, ellerîn kan îçînde, yüregîn derd îçinde, sakın ola söz taşıyanlara itibar etme, bîr de seni olduğundan büyük gösterenlere, sakın. (Axayê min destên te di nava xwînê de ne, dilê te di nava kulan Tte ye, binêr ha, nîrx bi gotin guhêzan nede û kesên te ji rastiya te mezintir nişan bidin, emanet.)' Piştî ku min pere danê gotina dawî gote min: 'Çarenûsiya te bi tavên Biharî ve girêdayî ye.' Heya îro gotinên wê jina qereçî ku kulma benîşt mîna çêleka Şerabiya ku kayîna xwe dike, di şikefta devê xwe de dievciqand, di nava birçîbûneke fîtoskî de di nava diranên xwe de dibir û dianî, dicût, di guhên min de dikin çingênî. Min û mirovê ku ez û ew di nava xeftanê yek çarenûsiyê de bûn, ango Sadun Beg, di nava bêdengiyêke bê şîrove li hev nêrî. Sadun Beg ji Amedê bû. Xortekî zana û di nava derya pirtûkan de, hemberî bîstûdu saliya temenê

xwe, têra xwe köhne bûbû. Piştî sê mehan, nû me hevûdin didît. Wê rojê xiştika pêxwasên Amedê li ser dilkê min, ku katik û tirhika welatparêziyê tê de pişkivîbû, bi gurr û hêzeke kîndarî mezin dibû, birîndar kir, çilmisand.

Pêşî min jê pirsî:

-Çi heye, çi nine, tu ji welat agahiyan distîne... Guhên we beg û eşraf û paşazadeyan qui in.

Di cih de rengê Sadun Beg guherî, bi madekî tirş, awireke şikestî li min nêrî, fişşâna têr keserî di dev û pozên wî re fûrî.

-Xwedê neke ku ez paşazade bim.

Gotin, ji devê wî bi kûffêna mar p

Min di nava seyrekê de dest bi pirs -Çima gidî, xwedê xêr bike Sadi Sadun Beg bê deng, qotiya xwe derxist, hêdî hêdî dest bi pêçana cixarê kir. Qet deng ne kir. Min dêhnê xwe dida tivêla ruwê wî, livandina lêvên wî. Heya bi mijgulên wî, bi reşika çavên wî re dilerizîn. Sadun Beg cixara xwe xelas kir, qotî dirêjî min kir.

Min cixare ne dikêşa.

-Spas ezbenî, ez cixarê na kişînim.

Sadun Beg, mizzeke kûr li cixarê da û got:

-Bê çawa ji gundiyan re namus û xîret pêwist e, ji beg, axa, eşraf û paşazadeyan re jî xîret û namus gerek e.

Gotineke giran bû, xwedê giravî ez axa bûm, lê ew jî beg bû û wî berî ku ez bi axatî xwe pê bidime naskirin, wî bi begîtî xwe arzûendam kir, min ne girte ser xwe, lê hinekî bi guman axivîm.

-Te xêr e Sadun Beg, wiha xuya dike ku tu gelekî bi derdî.

Serê xwe hejand, fişşân pê ket. Gotin bi fişşâna wî re ji devê wî dipekiyan:

-Rast e, derdê min pirr e, lê ev derd ne mîna derdên din e.



Ez bê sebir bûm:

-Qey tu nabêje xwedê jê razî.

Sadun Beg çend mizên din ji cixarê dan û berdewam kir:

-Em xwe dixapînin mirovê delai. Bi dilsozî, şerê azadî û rizgariyê nayê dayin. Mirov carekê tê cîhanê û temenekî kin dijî. Kes bi têrahî di nava temenê xwe de, bi têrahî karê xwe ne biriye serî û ne gihaye armanca dawî. Gilgamâş, berî Isa bi du hezar salan, li ava jiyane ya nemirinê geriyaye, kanî?.. Zeredeşt pîrê agirê bi heft avên zemzemi ji agirê dojhê hatî şîştin ku di kefa mista xwe de ki findika mirovaniyê, Cemşîdê Kal ku hezar salî di şikefte de, j mirovan dûr ket, kanî?.. Pêxemberên axir-demê komên xelk<sup>feam</sup> duv xwe û gotin 'Xwedê, ev cîhan ji bo xatirê min ava kiriye, kanî?..' Stêrikên ezmanan dirijihin ser pelên dîroka têr dilxelênek. Ev çawa bext e, ev çawa dilsozî ye? Bi jiyana mirovan naye lîstin. Cîhan ne îro û sibe ye.

Gotinên ji devê wî derdiketin di nava kirasê keserî de pêçayî, û dûrî zanabûna min bûn. Ji hêla din ve dilê min pê şewitî.

-Çima gidî, xwedê xêr bike Sadun Beg, i:u mirovekî xwende, zana yî, dilqewîn be.

Sadun Beg beşîşî.

-Mirovê delai, ez dilqewîn im, lê kesên ku xwe dikine rêzan û serkêş ji me re dilkurmî ne\*

Ez ji erda xwedê ketim. Ya rastî min ne dixwest ku li welatê biyanî û bi hezaran kilometre ji Tora Hevêriya dûr, mirovekî ku nû îro me hevûdin nas kiriye, di derbarê serkêşên Kurdan de gotinên nexweş bêje. Çawa hebe di nava van serkêşan de para pismamê min, em ne li hev ain, dijberê hev bin jî hebû.

Bi dilekî guman:

-Tu behsa kê dike pismam?

Sadun Beg:

-Ez behsa mala paşe dikim, mala Cemîl Paşa... Paşayân bê rûtbe, bê r'sa u j Amed rakirin ser lepan, du kesan ji wan serkêşiya me dikir, yê din xwe li cem Mistefa Kemal Paşa xweşik dikirin, gotin mihdiyê axir-demê ye. Çawa zarowên wan hatin girtin, li vir ketin, li dera din ketin, bûne rêwingiyê deristanê dewletê. Geh li Ankara, geh li Amedê... Mistefa Kemal Paşa li kuderê bû, yek didu ji wan li wir bûn. Dawî balafir ji Roma Reş re kirîn. BalafirL Her du zarowên wan, mîna tu mûwekî ji mast derbixe, ji nava heval û hogi- ran derxistin. Heval û hogir şeq kirin, yê mîna min ku bi dilekî paqij, bi evîneke kelgermî nêzîkî wan bûn, di deveran werkirin, wan cezayê girtêgehê xwar.

Dema mijara balafirê kir, ya rastî min di dilê xwe de got: 'Xwezî bi wan, dikarin balafiran bikin, hewqasî dewlemend bin, ne hindik e.'

Bi zimanekî çav nebarbûnî:

-Ew malbat hewqasî dewlemend in?

Sadun Beg:

-Ne gelekî bi tenê, liqasî Qarun dewlemend in.

Çîrokê bala min kişand...

-Piştire?..

Sadun Beg:

-Piştire, bi hezaran zêr bifermoyî dewletê kirine, zêrê zer û zarowên xwe ji girtêgehê xelas kirine. îro nameyek ji min re hat, dibêje ji girtêgehê derketine.

Min peyva wî birrî:

-Qey ne baş e ku xortên şiyar ji zindanan derbikevin? Ziyana wê nîne...

Sadun Beg keniya:

-Di dadgehê de heval û hogirên wan teva hatin şeniqandin. Gelek ji wan bêyî dadgeh kirinê hatin kuştin. Mirovê delai, pirsgirêka Kurdan bi duristî û dilsozî çareser dibe. Ne bi muxennetî... Çarenûsî, nexasim ku ev çarenûsî ya gelan be, nexasim ya Kurdan be, bi dirûtî, bi xiyanet "i x m û rîpan, bi cotstandardiya kesayetî nakevê dest. Ne lîstika zarokan e, jiyana mirovan di masetê de ye, bi hezaran mirov, zarok, jin, kal, welat...

Mîna xiştek li ser dilê min bikeve. Tiştû di dilê min de pişkivî bû, diçilmişî.

Begê dilşikestî berdewam kir:

-Teva mîna qijnikan bi xwîn û goştâ Kurdan mezin dibin. Cemîl Paşa ku malbat teva xwe li ser navê wî dikine paşa ne esker bû, mutesarîf bû, piştî xwe da Osmanîyan û gund û zeviyên xizanên Kurdan, ji destên wan standin. Pêl ahên û qîrêna xizanên Kurdan kirin, dewlemend bûn, mezin bûn. Yê mîna Bavé Tujo darve kirin, yê mîna Cemîl û Ekremê Mala Cemîl Paşa, ku niha ez çîroka wan dibêjim, bi bertîl û ruşwetê, balafir û bi hezaran zêr xelas bûn. Çima ku ew paşazade li ser xwîn û kuştîyân Kurdan, bi saya Osmanîyan runiştine, qelew bûne, xwedî tekyana giran bûne.

Min ne Bavé Tujo nas dikir, na Cemil û Ekrem.

Mêrik çavên xwe girtin û devê xwe vekir.

-Kesî ji me bîr nebîr, kesî ji me... Ew kesên ku li Ewropa dixwendin, bi banga Ebdilhemîd, dev ji xwendina xwe berdane hatin hawarê, dijî Ermenîyan bûne fermanîdar û şer kirin, bi hezaran Kurd di nava piyên eskerên reş de hiştin, bûne sedema ku jinên Kurdan zarokên

xwe biavêjin Newala Sêwiya, wilo xizan û perişan kirin, bûne serkêşên me. Kesî ji me bîr nebir... Liqasî Osmaniyan tewanbar in. Her gotin û galgala wî mîna tu xencerekê li ser dilê min bide. Hêdî hêdî pêl û şelqên poşmaniyâ li peleguha dilê min diketin. Bala min jî dikişand.

Beri ku ez biaxivim, dest pê kir.

-Xwedî tekyan in, perê wan di banken Ewropa de hene. Bav û birayên wan ku li dora Mistefa Kemal Paşa perwane ne, têr û teji ne. Her du aliyan, her du milan dixun. Ji wan re ne xem e. Şepirze nabin, kesên mîna min, yên mîna te gundî, di şer de, di girtîgehan de yên li pêş in, yên birîndarî û kuştinâ ne, li sergomê garute dimînin, ji bo debora xwe bikin firaxên aşxanan dişon, paqijiya sazî û dezgehan dikin...

Sadun Beg bi dilekî mîna êlekê wî caw reş, gotinên têr rexne li duv hevûdin kirin şelîpan. Dil bi kul bû. Ya rastî gotinên wî dilê min jî dax didan. Her gotina keserî ku di şikefta devê wî de di ser serê xwe ve digindirî û bi hêrs dipekî, mîna bista di nava agirê telîşan de sor bibe, dilê minî birîndar dax dida.



Ew sal, mîna teyrê Eylo çeng şikestî, mîna teyrê Sîmurê pirtikandî, bi beza seglawiyeke qerem şikandî derbas bûn çûn. Her roja xwedê ez û Sadun Begê Amedî dihatin kêleka hev, wî digot min guhdarî dikir, min digot wî guhdarî dikir. Gotin û galgalên me her du basikan, serpêhatî û nirxandinên jiyana me bûn. Sadun Beg digot, sergom bi gotin û galgalên serpêhatiyan xelas dibe, wekî din kul û derdên wargehên biyanî, awir û gotinên terezbavî ku ji xelkê tene me, awir û gotinên polîsên îmza me distînin, mîna mezrebên nîkr û nekîr wê me bihelînin. Em her du mirovên ku çarenûsiya wan bi

hevûdin ve girêdayî bû, di her reng û cureyî de, bûne destek ji hev re. Hevaltiya

sergomiye şêrin e, me ji hevûdin re soz da, piştî vegeerê ku têkiliya me berdewam bike, em hev bibinin, biçin mêvandariya hevûdin. Gelek tiştên din jî, gelek soz û peymanên mezin, ku li ser çarenûsiya gelê Kurd, mina morîkên qetiyayî bi darvekirin. Pirranî wî plansaziya paşerojan fikir, min jî xwe dida ber nijdevaniyê. Lê çawa çarenûsiya min reng guhert, kirasekî din li xwe kir, bi Roma Reş re têkiliyên min çêbûn, bûme serekçete, Sadun Beg, plansazî, çarenûsiya gelê Kur dîrok, ji bira min çûn. Wî jî li min ne pirsî.

Çawa ji sergomê vegeeriyam, ez liqasî cîhaneke di nava xwînê | gevizî bûm. Saroxanê kurapê min, darê kuştina Haco dideyne, îcar vê keskûniyê bi kê re dike, bi kurê Haco re. Hey gidî, li heydênî û kizîra nezaniyê. Kurê Haco Nayif, xwarziyê Saroxan e û dibêjiyê: 'Xwarzê bavê xwe bikuje û were cem xalê xwe.'. Waweylê keskûniya nezaniyê, keşkûliya tacîdariyê!.. Bitirbûneke ne nivîsî, nexwendî dest pê kiribû. Hewa di nava barûda bi xwînê, bi dilo- jarêya pîrebiyan hatî kûtan, çavê her kesî kor kiribû. Çawa Saroxan darê kuştina Haco, bi gilî û yarîyên bitrîtiya tacîdariyê diaxive, kur li bav mikur tê. Û piştî ku Xelîlê Batê, ku gotin bi navtêdanê Saroxan hate kuştin... Hingî agirê kuştina Saroxan di dilê Haco de dibê hêtûna derengmayî. Haco, zu ne dereng berî ku Saroxan serî li çareseriyên din bide, kemîn li ber Saroxan danî. Saroxanê li ser dilê min şarîn, mîrekê Axan, ku^jji civata axayên xwedî çadirên duwazdeh stunî de, bi devê xencerê hêrsa xwe nîşanî xelkê dida, bi darbeke bêbextî hatibû kuştin, ne erdê ez qeblu kirim, ne ezman. Pirpirîk û gulbijêrkên dil û mêjiyên min firiyan çûn.

Nexşeyên tohildanê li ber min vebûn.

Sund i<sup>^</sup>idên ku min li bedena xwe, li canê xwe dayî, bi her sê qasem navê xwedê sund xwarî ku ezê dijî Roma Reş şer bikim, bi yek carê ji bîra min çûn. Ew Hiseynê diber şibaqa suwariyan de ber bi welatên reş-tarî de pêl dilê xwe dikir dijwar dibû, çû, yekî din hat. Kîn û buxza Tirkan ku di refik û beltikên dilê min de li hevûdin gihabû hev, di cih de berê xwe guhert. Bêhn û bixara kizîra cîhaneke sotîkirî kete pozê min û demeket. Gotinên Sadun Beg teva hatin ji bîr kirin. Kuştina Saroxan li ber min bû fik û vebû. Kesên mîna Rîtalo, ku navê wî yê din Heşto bû, kî bi hêz ba ne hevalê wî bû, lê têra xwe ewan tî dikir, mirov ji rê derdixistin, dema dûvê meqilkê disincirî, mîna paşazadeyan tenê diaxivîn, kûmê mirovan diavêjin nava ziyanan, ji holê winda dibin, li kêleka min peyda bûn, mêhna min ketiyê. Rîtalo, ango Heşto, yan jî bi navê rastî Isa, xwe bi min firkandin. Li gorî dilê min diaxivîn, li gorî dilê min dev diavêtin xelkê. Ez keskûnî dikirim, ez tûj dikirim. Piştî neçarî, bêzarî û perîşaniya salên sergomê, fika li ber min vebûbû, tacîdariya Hewêriya dida min. Ew tacîdariya bi xwîna kurapên min hatibû şîştin, maf dida min ku ez tacê deynim ser serê xwe... Meydan jî vala bûbû, ez û ez bûm. Min careke din Geboryê Isayê Zetê da pîşîya xwe û qista deris- tana dewletê kir. Na nebû!.. Di cih de min îcaze stand... Mohra tacî- dariyê dane destên min... Paye serekçeteyî dane min.

Mîrata Mala Osman teva bi min ma, ■'.

Rojên di nava çarçoveyên bi ava zîv û zêr, mîna ronîşankân ava dibin rojê de melûl diçirisanandin, li pêşîya min bûn. Tirsî mirinê bi tenê cih dabû şadûmaniya dilê tejî kul û keser. Heya ji min dihat kul û keserên dilê xwe, bi zor û hêrseke durî hişmendî ditemirand. Sergomê, nexasim piştî hevaltî û hogirtiya Sadun Beg, ez fêrî gelek tiştan bûbûm. Min dixwest tirsî mirina bi tenê, ku jinika qereçî, di

nava çerq-çerqa be MŞ O xwe de ji min re darvekir, weke têba mezin bikim, bi sehwa bikim. Min dixwest sehwa xwe bela bikim, navê min li kuderê bête gotin, xelk bilerize, bi veciniqe. Ji berdêla kes û kûs bi rebenî û nêçariya min mijul bibin, guh berbidin ser reş û beşên ku ez bi ser wan de bihêrivînim. Bila bi ser kul û birînên xwe de binalin. Ya baş êrîş bû. Bi arz û endameke debdebeyi û şatafat min dest bi serekçetetiya Roma Reş kir.

Cîhaneke aram, bêdeng, safî çîk sayî!..

Stêrikên ezmanan di nava valahiya bi tenê de, bi tayên xaf girêdayî, wilo daleqehayî avjenî dikirin. Ez serekçete bûm û bi buxz û tolhildana salan, ha ha min destên xwe dipaland. Ezman sêwî mabû, stêr sêwî mabûn. Rêbûwariya dewsa rêwingiyên xwedî şelîpanên karwanên ku dîrok û çand ji nava têr û cembiyên wan diweşiya sêwî mabûn. Xanên di nava toza dîrokê de temirîbûn, ji bê kesî, ji bê hîrêna hespan, horhora ciwamêran sêwî mabûn. Riyên zemanî ku dibin lingên şepola yên bazirganên Cihu, Ereb û Persan de hişk bûbûn, kerrende. bê kes mabûn. Heshesûk û simaqa qeraxên rezan, geneka dora werzan ku berranî şîn dibû, kesî ne dikirî, ne bazar dikir. Xeyalên koçber, birçî di qui û qewêrên şevân tirsonek de, li ser pêpelûk, beltik û refikên lal, têr hishisî, xwe vedişartin. Tenê borezanên diljeniya min ku bê perr û perwaze mabûn diqîrîn, li meydanê xuya dikirin. Tenê dengê min di nava gerduna bê ser û bin, bê tixub de olan dida.

Bizrê jiyanê hatibû qelandin.

Tenê çiya, çiyarêzên Tora Hevêriya bi tenê, mil dayî hev di nava xummêneke stur û li hevûdin pêçayî razayî bûn. Bi sedhazaran aşê cinan, bi milyonan aşê cinan di kûraya dilê çiyarêzan de kar dikir.

Xummên ji zikê çıyan dihat, difûrî. Kesî ne wêrabû bi rêbûwariyê jî di nava newal û mesîlên Çıyarêzan re bibûre.

Rojekê ji wan rojên hejmartî Rîtalo nûçeyek gihande min. Li gorî Rîtalo digot, gundiyên êla Domana ji koç û mal ji Binya Xetê veg-eriyane, li cih û warên xwe cîwar bûne, dextl çandine, werz çandine, rez kirêb kirine... Bênderên wan teva di nava lodên genim û girîşan dextlê de vemidandî ne. Rêsi li ser dîwarên hewşên xwe, li ser kevîkên banê xwe rêz kirine. Min berê xwe da deristana dewletê û bi gilînameyê devkî got: 'Hevalbendên Haco vegeriyane, çavê wan lê ye ku tevgereke nû hikin'. Tacîdarê Tora Hevêriya ez bûm. Dewlet ez bûm, destûr ez bûm. Navê Haco, ji bo dewletê seferberî bû. Welatparêzan jî nanê xwe bi Haco dixwar, alîgirên dewletê jî nanê xwe bi Haco dixwar. Êdî hesab li cem te, alîgitên dewletê giliyên xwe, kesên raçavî xwe dikirin bi navê Haco tewanbar dikirin, nanê xwe dixwarin. Nanekî kurmî!.. Min li pîpîkê dida esker ji qijlê derdiket, min destên xwe bi gundan ve dikir, esker û çeteyên min, ew gund sotî dikirin.

Bi wê teşlîhê, di nava dijwariyêke dilşewât de, min girte ser gundên Domana. Ez û çeteyên xwe, bi dijwariyêke toi hildanî bi nava gundan ketin: Zinarex, Temerzê, Agrî, Kefsûr, Basaq, Bêzîka... Kişûmat... Teva, me dane ber xwe û bi rêza wan de hatin. Pêşî me bi gundiyan dest pê dikir, gundî, di nava pörîşanî û bêzariyêke gevzonekî de li hevûdin kom dikirin. Yek bi yek dirazandin felaqe. gawo pîro te çi xwariye, bi rêzê, xort, navser, kal, kişûmat, heya lingên wan dibûne heban, dipeqîn, vîqasî, çeteyan dor dikirin, quredar li binê lingên wan dihejmartin. Têhna min veneşikest, min agir berda dextlên bênderên dibin lod û komên dextlê de winda, min agir berda komên rêsiyêWi seiNdy^ar û kevîkên banê xaniyan.



Gund bi gund, bi rêzê em bi wan de hatin, gundek xelas dibû, em dibezîne gundekî din.

Gundê dawî, ez li ciwanîka kumeyt suwar im, di dora agirê di nava dumanêke reş-tarî, ku bi qîrên û hawara jin û zarokan re ber bi 11

' ' ' ... . ek ji zilamên min ber

Min berê ciwanîka kumeyt ber bi esker zivîrand û bi teleb çûm.

Fermandar, li ber siha darekê, şipê rawestiya bû, qamçiyê di destên xwe de, hêdî hêdî li bedena cizma xwe dide. Çawa ez gihame cem bi dengekî bilind pirsî:

-Tu yî Hiseyn Axa.

Fermandar bi Kurdî bi min re diaxivî.

Di nava şaşiyekê de hinekî lerizîm, lê min xwe zu da hev.

-Belê ez im Hiseyn Axa.

Bînbaşî, qamçiyê xwe ber bi benderan ve dirêj kir.

-Çi mafê te heye tu vê buxî û zordestiyê li gundiyan dike? Çima tu wiha dike? Bender ked û xwîna gundiyan e.

Min dizanî ku çî pirsê dike. Ew gundî hevalbendên Haco bûn û min ew dijmin didîtin. Min devê xwe dagirt ku bersiva wî bidim Bînbaşî ne hişt, dest bi axaftinê kir.

ÇÎROKA ME Û

DEYDÎKA HERE WERE

Beşê duyemîn yê çîroka min ji serîhildana Bagokê dest pê diki Hingî kelihek, hemberî keliha rûmet û xîretê hate ava kirin. Keliha ku di nava ronahî û xemla dilê mirovaniyê de şadûmanî dikir, bû nîşangeha top û meterilyozan. Çîroka wêranî û malkam- baxiyê.

Çîroka xiyamet û bê xîretiya hejarî... Hingî keliha dijberî û dubendiyê, berz û pevçûnê, bi keskûniyeke têr şermezarî di dilê me de, mîna kûnêreke iledarî, têr kana kurmî hate ava kirin.

Heyho birazî!.. Hey gidî!..

Kî dibêje du serî di beroçekê de na kelin? Beroşên heft çembil çêbûne birazî... Ne du serî çardeh serî, ûi wan beroşan de dike-lin. Mirovê mîna me ku hişê xwe xwaribin, ji van gotinên bê aqilî bawer dikin. Kî dibêje ku rast e. Serê mirovên Roma Reş ku min xwe ji wan re kir\* destûbirakê cîhanê û axretê, lê ew bi heft newal û heft mêrgên çîrokî ji min dûrbûn û yek ji me ne diçu firnikê hespê wan, ji Stembolê heya bigihê Şam û Bexdayê di yek beroşê de dikelî, ye me, di nava herêmeke teng û tixûbekî biçûk de, du serî di beroçekê de ne dikelîn. Kanî ji vê helwestê xerabtir û malkambaxtir rewş? Ew dewlet bûn, emperetorî bûn û paşa, wezîr, padîşah, mîr û mîrzade, beg û begzade û maqulên xwedî dîwan, xwedî xanûman, qesr û qonaxên çar bircên çar goşeyî dibin rima wan de dijîn... Bi hezaran kesên ku xwedî esker û tewl û bertewl hebûn, ji rojhilat heya bigihê rojava desthilatdariya xwe dimeşandin. Şax û maqûl û bazirgan û mîr û beg dibin destên wan de li hevûdin diciviyan, bi hevûdin re dizanîbûn bi rêz û dîwan bijîn. Em çar parûtkê Mala Osman, diketin zîqa hev û du kesan ji me nikarîbûn li odeyekê, di kêle- ka hev de rûnin, çar eşîren ku hejmara wan bi sînore, di nava tixûbên wan de bi hejmar, gelek gelek deh gund hebûn, par vekin, rêz bikin, bimeşînin.

Tucaran pesnê xwe bi me nedin û nebêjin bav û kalên me bîstûçar eşîr idare dikirin. Bavûkalên xelkê dewlet idare kirine, kelih ava kirine, pîrr. û koprî ava kirine, xanûman, qesir û qonax ava kirine. Tekyana ku dikarîbûn balafiran bikirin dabûne hev. Me, di nava

keşkûlî û zexeliya dilekî bextreş, têr reşbînî de xanûman wêran kirine. Tekyan, mewdan tertûbela kirine... Qet pesnê xwe bi me nedin. Em ne layiqî wê çendê ne. Tovê waweylê çawa zerzilî be, em wiha ne. Ji berdêla ku Osmanê Silko, ji nava hêrik û kavlê Zaxuran berê xwe bide Mizîzexê, bila berê xwe bidana bajarekî û payîtexta xwe li wir ava bikirane. Hate Mizîzexê çi kir? Bili ku top û cebilxaneyên Osmaniyan û Ittîhadiyan bêne ser wan û her dem avahiyên wan wêran bikin? Mala xwe ji, mala xelkê ji bi xwe re xera kirin. Binêr riya gundê Mizîzexê nine. Binêr ava gundê Mizîzexê nine. Biner dibistana gundê Mizîzexê ne weke ya xelkê ye. Binêr, nexşeya Mizîzexê ya Kudistanê ye ku ne rê heye, ne av heye, ne dibistan heye.

◆ v

U hîna ji ez li ser navika xwe dibirim, ku ez ezîzê dilê dewletê me. Nexşeya bê nasname ku di nava nexşeya cîhanê de bê cih, bê nav maye.

Mizîzex nexşeya Kurdistanê ye ku rengê wêrani, renga şermezariya mirovaniyê nişan dide. Ê rewşa Kurdan, ku ji 'werda gulîstanê' wêdetir, keşkûliya di nava malkambaxiya xiyanet û bêbextiya dijberî de, bi diljenî nişan dide. Basimbara herhilî ye.

Rast e, tê bêje ku min bi pismamên xwe re hevkarî nekir, ji bo tacîdariyeke têr xwîn, têr kasûliya zikreşî, destên dewletê girt. Rast e, ez bi dilekî xweş, bi zanîn, li dinava reşbîniyeke dilxerab de, bûme serekçetê dewletê, ez bi keskûniyeke dilkurmî hemberî pis-mamên xwe derketim, min şere wan kir. Rast e!.. Reşbîniya dilê min, gûya tacîdariya min bû.

Ez palê xelkê bûm birazî.

Palûta kurê ciwamêran bi mirovên mîna me bêaqil dihate kirin. U her roja xwedê govenda şînê li devê dergehê me bû.

Ewrên bê berf û baran, bayê bê têhnik û bê wens... Bablîsokên di nava qirşûqalan de pêçayî ber bi hev bibezin jî xêr nake. Kulmoza ku zextik di nava wê de rabe, bi kom êrîş bikin jî xêr nake. Med hate stendin û rê li ber me winda bû. Ew kîn û buxza di nava me de kom bûye bi hêsanî demakeve, em nikarin di rojekê diduwan de vala bikin, hinavên xwe paqij bikin, ava kîmyewî ku di nava mêjiyê me de, di newal û mesilên qoqê serê me de digêrê, bi hêsanî nikarin biguherin. Avşolka lewitî... Şilemaniya gemarî... Têr kefzê... Bi demûş û zelîqonkî... Çend çemên mîna D oie û Feratê... Çend golên mîna Wanê... Nikarin paqij bikin. Ew berojk û gastînkên dora Midyadê ku ji bê rewayî hişk dibin, bibin gui û gulîstan, ew beroj û nizarên dora Êstilê bibin benderên bilbizêk û kulîlkên heft rengî xêr nake. Newala Bûnisra, heya bigihe dawiya Beriya Xelef Axa bibe miştaxa 'ebrû helala' xunafi sud nade. Kîn û buxza hinavên me safî nakin. Roma Reş, êdî hejmara berê tiv- ingên ku li qesra hikumetê ketine, heydêniya serê Bagokê, fiqên û qîrêna pozberanên simbêl so inî li binya Taqa, heya bigihe Selhê û dora Sarê û Basibrînê, ji bîr nakin. Heya ji wan be, wê me bînin hemberî hevûdin, Sud girtine, ji du bendiya me karê wan heye. Jinên bî, zarokên sêwî nikarin tişteki bikin. ŞivaM bê pez be şadû-  
maniya dilê guran e.

Pêşî li ser xwe bêjim...

Ez gunehkar im birazî. Rastî ne ez bi tenê, lê dixwazim li ser xwe bi tenê biaxivim. Her kes nikare rastiya xwe bîne ziman, degelî, mêrxasî jê re dive.

Kuhiş û ramanê min, mêjîyê min, dil û hewnê min di nava agir de dikelin. Ez di nava xwe de dibirijim, lê xêr nake. Basimbara dilê min rengvedaye, mat bûye. Gula dilê min çilmisiye, Şalûl û Bilbilê baxçeyê dilê min êdî hew dixwênin û temenê min jî çûye, aha tu dibîne ku lingek ji yê min li gorê ye, bi kopal dimeşim û dema gotin ji şikefta devê min derdikevin lêvên min dilerizin, qurmê zimanê min giran dibe, ku dimeşim, serçîçeqa dilkê min dinepîxe, bêhna min diçike.

Giriyê zarokan, fişke fişka jinên ciwanik ku di kewna xwe de bî, sêwî diman: Ji ahêna wan mabe, têrxwarina min nîne.

Kê destên xwe dabe dewleta Roma Reş, jê ne nicinandiye. Ji xwe dizanim... Ji roja ku ez bîre wer bûme hey a îro dengê Çeqel û Torîkan, dengê Sisyanî û teyrikên kelaşan, dengê Qijikan, ji devê dergehê min xalî ne bûye. Kula çîrîzokê, bi karwanî li devê deristana ocaxa me didanîn, em bi xwe ne dihisiyan. Hê jî gelo!.. Hê jî em bi xwe hesiyan e? Me berda, êdî em ketine xiloqa a borê... Edî em dikarin pêsîra xwe ji bê mecalî û bêçareyî xelas bikin? Heyho ye!.. Heyho ye birazî... Bi serê bavê xwe û te bikim, serê werîs ji destên me derketiye. Hun dibêjin emê rahêjin serê werîs... Hun dibêjin em mîna we nakin. Hun dibêjin serê çardeh beranên di nava me de, di yek beroşê de dikelin, di yek teştê de tê şîştin. Bi raman û dilsozî, bi canfedayî diçine ser pîrsgirêkê. Lewra dixwaz- im çîroka xwe û Mistefa Kemal Paşa ji te re bêjim.

Çîroka min û Mistefa Kemal Paşa, guharekî Heyderî ye...

Ez û tu bi tenê ne birazî. Ji keliha xwîniya bi sed kilometreyî dur û li quntara çiyayekî ku tenê dengê çûk û marmarotkan tê me. Qîrên û banga zarokên bêçare li ber pêl û şelqên ba ketine, di qui û qewêran de melisîne, newerin derbikevin, newêrin, dengê mozoliyan, dengê

top û bombardumana balafiran ji guhên wan dernakevin. Dar û devî çavdarên bi hezaran sal in, lêbelê bê çav û gav in, lal in. Kevir û kûçên çiyarêzên vê stana bê xwedî, bi xwîna mêrxas û cengawerên ku li ser navika xwe dibirîn hatine avdan. Ez di nava wê tirsê de me ku hun jî mîna me liqasî bêbextî û telaqreşiyên bibin. Rîtalo, ango Heşto ji ser rûwê erdê xalî nebûne. Min destên xwe avête destên dewletê û min jî di riya bavê xwe de dest bi destdirêjiyan kir. Tiştêk ji ya min demeket. Di pey min de firazeyêke kizirî, bê dunde, zelût maye. Ne xanûmanên giranbiha, ne zevî û newalên xetbizêr mane. Ez dizanim!.. Ku ez liqasî

paşerojêke nediyar û wînda bûme. Lewra ezê ji te re çîroka xwe bêjim. Çîroka min di nava rûpelên pirtûkên te de nînin. Bila bibe guhar di guhên te de.

Bav û kalên me!.. Nifşê min jî di nav de...

Qelsê mêjiyê xwe bûn. Lewazê dîtî û ramanê xwe bûn. Pişt wan ez jî wilo. Çima wilo dibêjim tu dizanî birazî? Naaa birazî, t ya dilê min nizane, vî dilê ku bi çuwal û bendekan kurmîtil kişandiye, kul û nierez di ser dilê xelkê de rûnandine. Naaa!.. Kurd mîna kewê di rekihê de, li ber dilê kûnêrî, destên tortereyî kasûlî, fêrî kurtîlan dibin, dijî hevûdin in. Hemberî hevûdin diqebqibînin, hemberî hevûdin dihêrikin û hemberî dijminê xwe disilikînin, direvin. Dijberiya me dîrokî ye. Tuxm e, xwîn e, xislet e, tu çi dibêje bibêje. Ez bi xwe di vê çendê de heyirî ma me, nikarim navekî lê bikim. Dema min dirahiştta tivinga xwe û çeteyên min didane dora min, ji min weye ku cîhan ji bei min dibe dualî û cîhan teva berşan, ax û av, dar û devî teva dibi ı rima min re dibûrin. Hey waweysê, min ew cîhana xwe ya biçûk ne didît ku ez ji sînorê Mahsertê derdiketim, diketim axa Rajnî kesî nizanîbû ez kî me, ji kuderê me û kesî nizanîbû

navê teyrê min çî ye. Hey gidî, em çî tovê waweylê bûn. Min qet li çaroxê wan kesên dora xwe ne dinêrî, Hisîk û Cercul û Mihema, y an jî xiltê kor Silêmanê Teter, Mûrikê pîjaq xwar, Simkoyê poz xirimî, Ezdînê felûş û yên din ku tîrêjê kirasê wan li serdilka navika wan radiwestiya, berê zendik û bizmikê wan yekî li erş dinêrî, yekî li erdê dinêrî. Nêrîn û dîtina wan ji devê dergehê me heya bi Ziyareta Rastê bû. Te ji wan bipir- siya riya Dilokê li kuderê ye, coxfayya Çolemêrgê ji kuderê dest pê dike, wî mîna li çîroka Rastemî Zal guhdariyê bikin devê xwe ji hevûdin vekin û li te binêrin. Ji hêla mêjiyê xwe ve lewaz û misrî bûn û ez sertacê wan bûm. Hevalê Qijikê!.. Lêxe, bikuje, talan bike, wêran bike... Jiyana me ev bû. Pismamê min biryara xwe ji pêşî de dabûn û cihê xwe girtibûn. Ew, hemberî xeletî û şaşiyân xwe teva, di nava refê xwe de bûn. Kuştin, hiştin, girtin, talanî, koçberî, pê dilxweş bûn. Kesî nikarîbû gotineke ji gulê girantir bêjê wan. Wan welat jî, netewe jî nas kiribû. Lê min, ew riya ku bavê min dabû ber min, riya çûn û nehatinê girtibû. Bavê min çî

tov reşand, ew zad çinî, dora min bû, min jî tovekî xeremalî, pûç reşand. Mîna gilgilê çolîstanan ku bêhn û bixar jê tê çandiye, em binerin wê çî bête pêçiya min. Xwedê paşerojân min û zarokên min xêr bike. Min xwest zarokên min bixwînin û hinekî ji min cudatir tevgerê bikin. Em binêrin, niha wî dixwînin, eğer bi çîk bin û hinek xîret û namûs di serê wan de hebe, ji refê xwe qut nabin, riya dijminê nifşê xwe nadin ber xwe. Pêşî wê li gora kalikê xwe bigerin û kêlên ber serê wî kifş bikin, ser ava bikin. Da çavdînî cîhanê dikaribin wesif û pesnên xwe bidin. Poçmaniyê di zikê min de şax û perê xwe vedane, lê, ax ax birazî... Ez çawa bidime der, çawa bidime der?.. Gelo kesên ji min bawer bike, kesê dimin bigi- hijin wê hebin?

Edî gotin û galgalên min teva bûne, gelo!.. Hinekî ditirsim, raîmanallah ku ez ji devê xwe derbixim û poşmaniya di zikê xwe de verişim, sed sêwelekên guhê gundan û sîmsarê çaryana Midyadê wê bi derfehatiyeke mezin baz bidin ser serê min. Derba himandiye birazî, ne dideynim û ne radikim. Gotina ku dayika min ji min re gotiye, qaüb girtiye û dimeşe. Hewce nîne ku em hevûdin bi cewciqînin. Hewce nîne, xara di qalib de ye, ji cih livandin ne li xêra min e û ne li xêra kesî ye. Wezn e, pîvan e... Kefika mîzênê geh bi çepê de giran dibe, geh bi rastê de... Carinan tê hemberî hevûdin. Nobeteke cîhanê ye wê bêt û derbas bibe.

Em tovê ezbenî û ezgorî bûn.

Birazî, heya roja gonê ku Mistefa Kemal ew bêertzî da min, ez jî wilo bûm. U piştî jî min wiha domand, ji ber ku li xiş û hesabê min dihat. Bi rastî, ez li duv berjewendiyên xwe, yê rojê dibeziyam. Nêxasim piştî çîroka paçazadeyên xwedî tekyana giran û betîl û rûçwetê. Berjewendiyên ku di jiyana rojê de pêdiviya min pê hebû. Sibe li bîra min nebû. Paşeroj ji bo min çend otilme û çend mirovên ku bi quloçê kahrik û berxika xwe bigirin bînin devê dergehê qesra min bû.

Dewlet, maf û nasname!.. Çine, têne çi wateyê, ne xem bû ji min re... Min digot, ev tişt nan nadin.

Min bîra wan jî ne dibir. Ku ev tişt dihatin fikirandin min berê xwe dida cem midîlumum. Evîna min, şadûmaniya dilê min, mehrîcana mêjiyê min erka li ser çar perutkê gundiyan bû. Ew gundiyan ku bîstûçarsaetan kolana rez û zeviyên wan di bîra wan de bûn. Salekê seranser, bi dilaramî werz û rezê xwe ne diquraftin û bi dilxweşî dest bi çinîn û gêra bendera xwe nekirin. Berberî û dubendî... Pevçûn, kuştin, talanî, jiyana ku me bi desteka dewletê dida pêşiya



gundiyan ev bû. Wilo bihesibîne ku avahiyên me jî bi kul û kederên bend û berberiyê hatine ava kirin. Sewalên me, pez û dewar, teva geyayê tov kurmî dixun, şîrekî bi xwîn didoşin, bizrekî bê pizan didin. Aaaa, heya ku em gihane roja îro. Ahêneke ku di nava şorik û şorîstanan de birîndar bûye li meydanê heye. Xedar û bê kewniyeke ku nikaribe li ser lingan raweste. Qerem şikandî, tirsonek... Lewleba jiyana me, lewlet me şikestî ye.

Stûneke bê palik û payendek...

Axxx!.. Ax birazî, ku te dikarîbane sebeta sînga min vebike û li nava hinavên min û kûraya dilê min binêre. Agir çawa di nava newal û deştên hinavên min de gurrî bûye, çawa pêtên liqasî girîşan dora çiyayê Şûxanâ ku paluta roj û danekî li ser hevûdin dikin, hewa dikeve, dadikeve, ua vîrdorê hinavên min diqijilîne. Berbetanê ûrê min ji derd û kulan, ji kerban bê miraziyê deriztiye. Derqîtkê dilê min şikestiye. Bûyer û pêhatî, di ser her du kezebên min de bûne kûnêrên iledarî. Diçiqçiqin!.. Agirê hêtûna ku palûta sê gundan lê werê hev û sê birrên mêran li hevûdin dor bikin û ha ha, bi sexmeyên Midyadî, çiloyê li ber tavika Havînî kevnar bûyî xotî kûra wê bikin. Di herhilin!.. Dîroka bêhn çikihayî, dîroka îxanetê ku b: wîn û şîqêna dayikên kezeb herhilî, di resîfkên têr tozik û beltikên şikestî de qersifî bûne, tu yê bixwîne. Coxrafya di nava serpêhatiyên qerem şikandî de, di nava kiras û xeftanê dilkur- mî de pêçayî bidîtaye. Ewrên bê baran ku di nava kufika nezanînê de reş-qeliyayî bûne, bidîtaye. Gotin sud nade... Kes ji min bawer nake. Min gelek kiriye û gotin tenê kirinên mezin zelal nakin. Dever fereh e, pîne û riqayên devkî, ku huner nebe bê wate ne. Agir di nava hinavên min de difûre, lêbelê tayên têr guvaştina

## RASTIYA KU MIROV D'TIRSÎNE

Bêguman me dizanîbû!..

Rastiyek hemberî mirov be, çawa mirov têngihije. Niha em dizanin ku mînîbusa me xera bûye. Şifer hewl dide ku çêbike, rêwingî dixwazin ku alîkariya wî bikin. Ez dizanim ku tu biraziyê min î. Tu dizane ku ez mamê te me. Tu diçe dibistanê, pirtûkên te dibin çengê te de ne. U dizanim ez kî me, kurê kê me. U dizanim min çi kiriye, kiryarên min çi dane min, çi ji min birine. Hewce heye ku em vê rastiyê durrî çavan bikin? Me fikir. Me rastî durrî çavan fikir. Min digot, kurê gavanê gund, kurê Heyderê Salîkî, Mehmudê Şîro, Heyderê bav Êzîdî... Çawa nayê oda min, çawa roja palûta min xwe amade nake nayê, kar nake? Şaxo!! Şaxikê Şehîn, gihaye kud- erê ku li ber min radibe. Kurê Kesîro, ji kuderê heya bi ku derê, çawa diber min re dibûre û dikare silav nedê min. Axatî, pêstikurî ye, ezbenî, ezxulaman dixwaze. U wilo fereh bike, wiha pê de biçê. Rastiya ku min dixwest durrî çavan bikin ev bû. Cendirme dihatin, du cendirme bi tenê, du cendirme dihatin, du nefer bi tenê, em teva, kurê Heyder, Kurê Kesîro, Mihemedê Şîro û Şaxo bi hevûdin re, bê bijartin rêz dikirin. Ji > wedê bawer bike di yek rêzê de, car din gundiyên min, ku dibin rima me de bûn, ku derfehatiyeke dijminahî dianîn, rêz dikirin, hemberî pêstikuriya me, di wê rêza wekhevî de nixê me dizanîn, lê terezbavên romiyan, ya azinilleh... Bi qest, di nava gundiyan de, em dişikandin, ji hemuyan gurrê xwe di me, kesên ku navê axatiyê, serkêş û serdarî bangî xwe fikir, didan. Sed gotin bi pereki li duv hev dihejmartin. Heya ku me ew neferên qun bi riqa bertîl ne dikirin, ruşwet ne dida wan, rûmeta me û gavanê gundê me weke hevûdin dikirin. Me rûmet û nixê xwe bi ruşwetê dikirî.

Xîret û rûmeta bi çent otilme, hewqasî şikestî... Xîret û rûmeta bi ruşwet, di bin piyên romiyan de... Wî me bigîhînê ku derê, çiqasî tacîdar bike?

Ez li xwe bêjim, eğer min kurê gavanê gundê xwe ji cendirman biparastane, bêhtir xîret û rûmet para min diket. Rastiya min ku bi koratî diçûme baskî de ev bû. Ya ku mûrê me şikandî fikir ev bû. Min ji rastiya xwe baz dida. Rastiya min pêsîra min bemedida. Mihemedê kurê Heyderê gavan jî, Mihemedê Şîro, her dem hemberî min bû. Pişti ku ez, li gundîtiyê ne nêrim bi darê zorê ber bi wan biçim, ew jî, wê ber xwe dest hilînin, hemberî min serê xwe rakin. Ev rastî, ji darî çavên min ne diçû, rastiya min ew bû. Cihan dizî\ çerxa jiyânê digeriya. Ez tê ne digihiştim.

O

Pêdiviya min bi rastiya min nebû. Lê ne min didît û dixwest bibîn-im. Kesê ku rastiya min şanî min dida, dibû dijminê min. Rastî dûrî min ketibû. Ew rastiya ku êdî sud ne dida, bikêrî min jî ne dihat. Rastî di ber şibaqa top û meterilyozên Roma Reş de şepirze, şepola direviya. Cihê rastiye di jiyânê de, li ser erda cîhanê nemabû. Binya Xetê xêr ne dikir.

Bi ked û dengê wan gundiyan herhilî, reben ez xwedî nirx bûm.. Nirxê min li cem dewletê dîsa ew bûn. Bêyî Heyder, bêyî Mihemedê Şîro, bêyî Şâxo û Kesiro û kurê Kesîro ez ne tişteke bûm. Tekyana Balafirên bertîlî, zêrên ruşwetî, hewqasî mal û mewdan, tacîdarî, kursî, hêza zordestiyê, çavên min kor kiribûn. Ez şikestiyê rastiya xwe bûm. Ji ber ku lê xwedî demediketim. Ez bi wan li ser xewre-bezê xwe bûm, ez bi wê rastiye li ser Kerkidanê xwe suwar bûm. Li welat û coxrafyayên cuda, dema min çîrok û çîvanokên serphatiyan xwe ji Sadun Beg re digotin, ez bi wê rastiye hebûm.

Min bi destên xwe ew hebûn kire deydikê.

Kî hat û destê xwe lê da. Kî hat û lingê xwe lê da. Yê hat parçeyek jê kn bir, yê çû parçeyek jê revand û çû. Heya ku ez li ser rastiya xwe rûneniştim, min neperûşkân destên xwe di serdilkê rastiya xwe de ne dewisandin, min xêr ne ji xwe, ne ji dora xwe dît. Ez geh bi vir de hejiyam, geh bi dera din de... Tov nehate reşandin. Kesî. bavê xwe neanî bîra xwe, bi keskûnî tovekî rastiye ne reşand. Jiyan li gorî ragihandinên Rîtalo çerxa xwe dizivirand. Lewra tovê rastiye şîr nehat. Cih ciha da der, me pêlê kir. Tîrêjên rojê korîk diçirisîn, em di nava reşbîniyeke bê serûbin de dijîn, derdiketin. Katik û kulîlkên dane der, dibin ligan de diperçiqîn. Têhnik nedan. Reng nedan. Rastî kete bin ligan, em jî di nava pêl û çelqên nezanîne de xeniqîn. Bêder û miştaxên rez û werzan di nava pêtên agirê me de kizirîn. Jiyanêke kimizî ku bikêrî min jî, bîkêrî gavanê gundê min jî nedihat ma li meydanê. Keliha bêxîretiyê hate avakirin. Keliha xîret namûsê hêrivtibû, bûbû kivilê dilan. Keliha xiyane û bênamûsi bilind bûbû. Bircik û bedena rastiye ji holê reviya bûn. Wêraniye] dilan dest pê kiribû ku ne ez û ne zarokên min jê xelas nabin zarokên min dest nehilînin, heyho ye... Hingî zor e... Bircik û bei na sûrihkirî, di nava dirih û zîwana bûyer û pêhatiyan de dora me pêça bûn. Em di nava girîzokên têkçûnê de peritî, çilmisî mabûn.

je bê xeyalên we ikeribim ramanê eyên dilê min bête

Xeyalên te û hevalên te weke hevûdin in. Roj bi xeyalan dihile, bi xeyalan diçe ava. Heyv bi xeyalan kevan vedide, mehtabê bi xeyalan dixemilîne. Xeyal armanc e, qenc xerab armancê dide ber mirov. Bêje min, bo dizanibim çîroka min, serpêhatiya min ku dilê min di nava guvaştineke têr r ihn de helandiye, wê sud bidê we, yan na. Armanc çiqasî mezin be, mirov hewqasî mezin dibe.

tA ♦

Navê wê li we kiriye. Xwendekar...

Xwendekar, gelo xweser nikarin bibin teref, bibin hemberî dewletq2 Wê mîna zîxankên salé rahêjin we, serê we teva bi 'in-git in-git' hilqetînin. Serkêçê we kî ye, hun bi kê radibin û rûdinin. Serkêşê we, rêzanê we ku dixwaze bibe sertac û tacîdarê vî gelî, gelé dibin çarenûsiya xwe de perçiqiye ki ye? Çima kifş nabe? Hun di nava gund de, pirranî di nava xortan de tevgerê dikin... Tişteki ayan, ku firaza we bide xuya kirin nîne. Mîrek û beg û paşa û axalar di nava we de nînin. Hun dijî teva derdikevin. Hun ji serî û binî, hun dixwazin ku civakê bi carekê hilweşînin. Ku ez guhdariya we dikim, Sadun Beg tê bîra min. Barekî girane, gelekî giran e. Bê hilweşandin, ji nûjen de avakirin, guhertin çênabe. Rast e!.. Eger kevnariya dilan, reşbîniya seriyan, zikreşiya hinavan neyê şîştin, zor e... Eger tevgera civakê, dîlzarên gihane qonaxa bendetiyê neyên lerizandin, tevzînokên tirsî Roma Reş, bi teqîna tivingê, tozika tirsê ku bi serguh û çavên gelé Kurd de hatiye werkirin neyê miştin, zor e... Erd lerizandineke bê ser û binî, ji qurm dive. Eger ne wisa be, we mical bi vî karî nine.

Û berjeweniyên ku di nava civakê de hatine parvr drin, hun dixwazin, ji nûjen de hilweşînin, li xiş û hesabê me gelek mirovan naye; bi salane ku qalibek hatiye çekirin... Bi salane!.. Çarçoveyek hatiye saz kirin!.. Parçe kirina vê çarçovê ne hêsani ye. Têkçûn û mirina gelek tiştan e... Çî nê ku xwe qemûşka ava bi ax û remedîlka demsalan pingihaye, ji holê tê rakirin. Berxwedan, na ji bo we tenê, hemberî berxwedana we, berxwedana me jî dest pê dike.

Dabaşeke ku mirov li paş û pêşiya xwe, bi awireke dûr meyzên binêre ye.

◆ V

Lewra dixwazim serpehatiya xwe ji te re bejim, tu ji heval u hogiren xwe re bibije, d' ku bibe guharên Heyderî di guhên we de. Wilo xuya dike ku hun ji xwe razî ne, hun ji sertac u tacidarê xwe razî ne. Pêdivî bi me serspiyan çênabe. Lê bavo, me serspiya cawê xwe kifş kiriye. Dilekî kurmî, mêjiyekî kufik girtî... Em cawê şîştî, sifrê waweylê ne...

Xortanî navê nûjeniyê ye u li peşiya demê dimeşe.

Armanca me di nava sînorê mêjiyê me yê kurmî de teng dima. Lewra em ne gihane qonaxê. Em mane qersivî, di nava libade u qumaşê çoxikî de pêçayî. Wilo peritî di nava xeftanê bêkesiyê de bêzar. Dem hate guhertin, em nehatine guhertin. Cîhan dizivirî, çerx digeriya, em, hey waweylê...

Dest biavêjin kewn u bejna me, pêşî me biguherin.

Xortanî navê guhertin u nûjeniyê ye. Xortên ku cîhanê nas bikin.

Lê, cîhannameya we li ser kaba we ye, pirtûkên we dibin çengên we de ne. Cihana we ji ya me sed qatî ferehtir e. Me navbera xwe u berşanê xwe fereh dikir. Me navbera xwe u rastiya xwe fereh dikir. Me navbera xwe u coğrafya xwe fereh dikir.

Nifşê we cuda ye.

Mêjiyê me di çawên me de bû. Mêjiyê me di berjewendiyên rojr de bû. Xelkê tekyana welatê me kom dikir em li duv barek hejil piştiyek rêşî bûn. Xelkê mewdan ji xwe re dida hev, em li duv kedûnek dims u têrek savar bûn. Kahrikek bû... Berxikek bû... Çêlek u golikek bû... Xelk li duv tekyana mezin bûn, çawên xwe berdabûne gêra çarxa jiyanê, bi zivirandina cîhanê re pêl didane xwe. Pêl u şelqên di nava mij u morana diljeniya kasûlî de em birçî, tî, nezan u kor hiştin. Lewra beranê hewrî li devê deriyê me ne barri. Kewtêna cewrikê

yek sali dihat. Ku dibû cewr, romiyan serê xwe şanî wan dida, kûzên pê diket.

Se û kuçikên me, tajî û tolekên me ji mur şikestî bûn.



Beranê me quloç şikestî bûn, hewrî ba ne ji, poş ne didan.

Ziman hatibû jê kirin, çav hatibûne teqandin, quloç bi birreka Miradoyê Keşê yê kêrker hatibû birrîn. Musikayê Mala Hanûno ku bi berbangê re dibezîya cot û kesax û qurmik û merdanê, esra teng dihat li ser sidanê kêran rûdinişt û di xortaniya xwe de qêlek bû, digot, ev rojên han wê li me biçin gilîh, me yari û metroziyên xwe pê dikirin. Digot: 'Heya dawî wilo ji we re naqede, bes e, li firaza bavûkalên xwe binêrin, destên xwe biavêjine bajaran, destên xwe biavêjine kolan û karê darmêweyan.' Xêr dike!.. Diqediya, ji me re diqediya. Heya ku neperûşkên me weşîyan, rûwê me kete bin piyên me. Neperûşkên me ku me dikarîbû di rewa axê de biçikînin, bi cûzanê Ezîzkê Xirbihî hatibûne kuh kirin. Em qesibî bûn. Qesibandina mêran, qêlekîbûn e.

Zilamê qêlek bê dunde ye. Bê hêvî ye.

Tiştêkî din heye. Ku qet neyê ji bîr kirin. Qet!.. Mirovê dîlzar tirsonek in. îcar em, bi sedsalana ku dîlzar in. Dîlzarê komên xelkê hov û dirrinde. Bendeyên mirovên hoste û şewrexîyên zordestiyê ne. Bendeyên mur şikestî. Heya sehwa wan di ser wan re bibûre demeke dirêj û têr raperîn pêwîst e. Wekî din, bila kes bendeyî mêrxasiya me nemîne. Bende pâşî têne qêlek kirin. Qêlekiya ji mêjî û dil... Çend sedsal in em têne kuştin, serjêkirin, şeniqandin û koçber kirin, çend sedsal in?

Ne hêsa ye birazî...

Navê mirinê çiyê? Navekî bê nav e!.. Ku hê nehatiye danîn. Feylesof û zanayên cîhanê, kevin û nû, Gilgamâş, Zeredeşt, pêxem-berên axir-demê navê mirinê ne dîtine. Tenê bûye şûr û rima destên xwedê, ha ha dihejîne. Dêhnê xwe bide Roma Reş, piştî xwe daye Xwedê... Xwedê bi kar tinin, şûr û rima xwedê girtine destên xwe, bi radorî canê derdorên xwe dikevin. 'i ketin mala pêxemberê axir-demê, xwîn ji şûrê wan diniqutî, cubbê di ser milên xwe re kişandin. Xwedê li banê banî selikan çêaike gelo?

Yan, mîna zarokên ku morîkên xwe winda kiribin, digêrê, bo morîkan darvebike, ma ye heyirî?

Mamostayên di mê hatibûne girtin. Yan jî yek bi yek hatibûne şeniqandin. Mamostayên bê ziman, mamostayên bê pirtûk û defter, dikarîbûn çî bidin, çî bistînin. Komên xelkê di nava nezanîneke kûr de dijîn, di nava bêrêzan de mabûne sêwî. Sêwîtî kotîtiye, netukesî ye!.. Pirtûkên Sadun Beg dibin çengên wî de ha ha dixwend, ha ha digot... Ne nivîsî... Ez nikarim gotin û galgalên wî, raman û dîtînen wî ku ji min re darvedikirin bînim ziman. Ez bêjim jî qeto qeto ne, xêra wan nine. Eger wî nivîsîbane, erê!.. Hingî, dibûne malê paşero- jan. Mirovê ne nivîse nagihe aramancê... Armanca mezin nabîne, nikare bide berxwe. Nivîsandin, çandinî ye, bizrê xîretê ye, rê ye, şivîle ye, ronahî ye... Binivîsin, binivîsin, binivîsin... Ahên û qîrêna zarokan, diljeniya mêran, tirsî jinebiyan, waweyleya çarenûsiya di nava rekiha hesinî de... Kelhoşkên newal û mesîlan, gelî û nizaran,

ava li herik, xwîna rijandî, dilê kurmî, birînên xedar, dilên dawgan, pihîna dergehên girtîgehan, birçîbûnê, sergomê, rev û bazdanê... Newala Kûr, Newala Sêwiyan, Newala Qesaban... Guhîjka Tarîkê, Kura Bûkê... Keliha Xerabiya, Begê Beglayê... Xiyaneta bi



berê top û fişeken mozoliyan, evîna Zembilfiroş, keda Ferhad... Şikâra mêrên ne kefenkirî... Binivîsin ha binivîsin... Dîrok winda > coxrafya talan kiriye, alfabe parçe kiriye... Binivîsin ku quloçên \ di erd û ezmanan ne hilin... Kevnariyê, nûjeniyê reşbelek bikin Kevnarî zingara dilan e, nayê şîştin, bikujin. Maqul, axa, beg, wL,, yan jî wekî din bendeyê dewletê bûn. Ew rewsenbîrên ji finasên der- dorên xwe direviyan, bêçarê bûn. Navê awaretiyê bi wan ve kiribûn. Çendek li meydanê hebane jî, kesî guh ne dida wan. KesîL N nava gotin û galgalên awir şikestî de dimane tenê. Mîna qeçmerên guhê gundan, nîşangeha yarî û tinazan bûn. Rastî ev bû ku me pêlê dikir. Çîrok û çîvanokên odan, efsanê û destanên dirêj ku di şeven dirêj de, bêyî şîrovekirin dibûne rêzanê me, em giha.x ne qonaxa îro. Ji dev digiha dev, ji dest ne digiha dest, ji dev digiha guhan... Guhên bi çingêniya bizmarên bê sidan û ça';Lç d) .atin çêkirin... Çiqasî dikarîbûn deng bidin? Mîna şûrâ ne avdayî, di nava têhnika germê û têhnika avê de berbûtî nekirî, çiqasî dikarîbû berxwe bide?

Çîrokên we di pirtûkan de ne. Destanên we ji nava atlasê dilan derketine ser kaxezan. Zarok rêzê digirin, li yek xurrênê, bi yek devî, teva weke hevûdin dibêjin. Çîrok û destanên me, di nava heydêniyeke bê wate de difetisîn.

Civaka ku serspî û aqilmendên wê bibin qeşmerê xort û zarokan, qey tu nizane ku xwe li ser lingan nagire. Şewirmendcn demê, di nava rêçikên şevê de mabûn û rê û şivîle ji ber wan winda bûbûn. Riya derketina ronahiyê ne didîtin. Êdî gorîstana dilê mirovan bûbû wargehê Kundan.

Kundan li kelih û bircikên dilê mirovan de dixwend in.

Ku Kundan dengê xwe dibirî, Pepûkê dilojarêya dilê xwe ku kezîkura xwişka yek birayî ji bo çend pîvitkan mala xwe û ya bavê xwe

belqi- tand û darekî sîxurî li serê birakê xwe, dunda mala bavê xwe da kuşt;

bi ser kezîkuriya xwe de, bi ser poşmaniya xwe de dilorand... Kê kuşt, min kûşt... Pepû, pepû, pepû... Kê kir, min kir... Kê kuşt, min kuşt... Em bûn... Me kiribû û me bi ser tengezariya xwe de dilojarê digot. Kê kir me kir, kê kuşt, me kûşt... Kî dikuşt, xwe dikuşt...

Em bêjin pepû jî xêr nake. Lorandina pîrebiyan wiha bû:

Çiyarêzên Kurdistanê bilind in lawo Mirin û mêrxasî bi hevûdin re dilorînin lawo Devê xeşim û bismika kêra agir vebû ye lawo Gotin û galgal xêr nakin lawo

Raze lawo de raze Xe w şîrîn e xopana tirsê giran e Roma Reş hat Kurdên xayîn pê re Dane ber xwe ref û birrên mêran e

Hêvî çiqasî dur e lawo

Nexweşiya ta û bayê bê derman ku Germava nava Erebiya, li quntara çiyayê Mava jî nikarîbû bibê derman. Gizîrtî jî bi me ne diqediya. Hinnoyê Gizîr ku bi salan derdê gundiyan dikişand, derdê muxtarê çaq werqîl î weke kabekî kimizî dikişand, ji bo rohnîk û girdikên ji ber romiyan diman bixwê fikir. Ew jî ji me nayê!..

Heydêniyeke hêleyî bû. Destvala, stuxwar!.. Keşkulî!..

Keşkuliyeke têr belengazî û perîşanî. Mixabin û sed mixabin!.. Em çîziya bûn, hajê me ji me nebû. Ketî û têkçûwî, ji pevçûn û berzê têr nabin. Rewşa me wiha bû. Me ji xwînê û goştê bêhn pêketî têr ne dixwar. Mîna teyrê ser kelaşan. Her roja xwedê canê me kelaş dixwestin. Her roja xwedê... Em têr nedibûn, xwîna dirijîha, têhna me venedişikand û goştê termên serdoran em têr ne dikirim Em Qijika ser birînan bûn.

Di cîhaneke têr û tejî de destvala û stuxwar... Palê nezanîn û bêzarên dil û mêjîyê xwe bûn em.

Tê bîra te birazî.. Roja gonê!.. Tu û kurê Heyder ê biçûk Kêfxisran, ku çîçikê ber kurka Fatimka dayika xwe, yeko yeko digirtin, dirahişte serê wan û digot 'in-git, in-git' serî bi rexeke de, beden bi rexeke de diavêt, bi hevûdin re, ji Midyadê dihatin. Li ber gund, li ser tilmankê bêrma gund, ez û hun tîqe tîqe liqasî hevûdûn bûn. Hingî dihate guhên min ku we tevgerek fikir. We xortên dibis- tanan, xortên gund li hevûdin didane hev û bi wan re diaxivîn. We behsa rastiya me fikir. We digot, eşîrtî miriye, axatî nemaye, mîna qijnikên guhanê çêlekan we dimerêsin. Ev têkçuna me bû. We rastiya me nîşanî me fikir. Me dîtin û têgihîştina rastiya xwe mirina xwe dihesiband. Qijnik bûn, li zora me diçû. Tê bîra te iv . isa? Min çi gote de, te çi li min vegerand?

Min bi dilekî kelogermî, awireke şikestî dengê xwe li we kir:

-Ez ji we agahdar im bê hun çidikin. Hun bi dewletê mijul dibin, hun dixwazin hemberî dewletê rabin. Ezê serê we kime bin kevirekî ku jiyana we û bavê we di zîndanên de korîk bikim. Sêwertalên heramî çepelno, sêwertalên weke we, ka: ên ji xwe mezintir dikin. Hun li nava gund çi dikin bi we dizanim, hunê hemberî dewletê serê xwe Çavên kurê Heyder yê spî, di nava serê wî de bûne lep û hew dikarîbû deng bike. Belkî lê nebû. Belkî ne xwest nojekiyên bike. Tirsiya ku ez xerabiya wan bikim, darbeyekê biavêjime wan. Li te nêrî. Te nemerdî ne kir.

Tu du gavan ji min vextirî û bi dengê hêrs: -Eger ji me be, emê di dayika dewleta te bigên...

Careke din gotinên Mistefa Kemal Paşa, ku dibin seqema Amedê di nava ser û çavên min werkirin, hatin bîra min. Careke din rastî derketibû hemberî min, careke din serê min û rastiya min tîqe tîqe liqasî hevûdin bûbû, lêbelê min ne dixwest bibînim.

Min nojekî dîkir. Rastî ev bû. We çî dîkir ez çî, gerek e min alîkarî û destek bidane we. Lê na, min astengî derdixistin. Ez bi xwe û bi hêza xwe derdiketim peşîya we. Min dixwest ku ez xwe li hemberî dewletê xweşik bikim. Dewlet hûtê heft serî ye, têr naxwe, ku te fêrî xwarinê, parî û tamûtîngan kir, bela xwe venake, dixwaze, her dem, her dem dixwaze. Mirov sê danê rojê dixun, ew her gav, her seat, her kêlî birçîye, dixwaze. Tu nediyê qîma wî naye, tu bidiyê têr naxwe. Min dixwest pariyekî bidimê. Çiqasî tu bidê hûtê heft serî, tu baş î, qenc î. Dema te parî ji devê hûtê heft serî qut kir, tu xayînê herî mez- inî, dest bi xwarina te dike. Lêbelê na, ya min ne xweşikbûn bû. Berjewendiyên di guhên kahrik û berxikan de diman bûn. Quloçên bi birreka Miradoyê Keşâ hatibûn birrîn bûn. Ne rez hebû, ne werz hebû... Ne cot û cotbarî... Ne dezgeh û ne sazgeh... Mîna qijnika li ser guhanê çêlekê, ji vb û dera din, bi çepaçûr û talankbina xelkê, bi dizî û tbsandinê, bi rastiya xwe mijûl dibûm. Rastiya min ez di tb- sandim, heya ku ji tevger û civanokên we dilsotî dibûm.

Ya we destpêka derengmayî bû.

Ya min şopandina xwe xapandinê bû. Rojên sergomê, di nava kev- nariya dilê belengazê Sadun Beg de, di nava qajikê devê jinika qereçî de, gelekî dûr û li paş mabûn.

Ya we gihandina ütopya, armanca xeyalên mezin bû. Ya min parastina pêlêkbin û nependî kbina rastiya bû. Bi rastî ez ji jiyana xwe, jiyana ku di nava xap û rîpên dewletê de bûbûne lîstika damis- tonkê ditbsiyam.

Rastiya, ew rastiya ku bizrê wê bi top û mozeliyan hatibû qelandin ez ditbsandim. Ez ditbsiyam ku careke din bi pişkive, kat bide... Cîhana min biçûk bû.

Di nava sînorên Tora Hevêriya de dima. Erê birazî, ew cîhana ku mîna xazulka zarokan li dora xwe bizîvbe, çiqasî mezin dibe? Ez kurê axayekî mezin, lêbelê lingê xwe kbe soleke hesinî, lingê xwe kbibû qeydûmerbetê, ne dikarîbû bibeze, ne dikarîbû raweste bûm. Rawestiya ba ne kursî diçû, bbçî dima, bazbidaye bi sitima ve, mîna pismamên xwe ku mala wan dimeletoyê re derket, diçû erdê. Wilo lê hat ji xwe. Bezî, bezî, bezî û bi stima ve çû erdê, dev û lêv lê şikestin. Axaftina me ya rojê çar perutkên êçîrên derdorên me bûn, mijara me xap û rîp û xefkên li pdşiya kesên dora me bûn. Li gund û xopana çaryana Midyadê galgalên meş û temtêla filankes û bêhvan kes bû. Heft herama xwedê be, ne me pirtûk dîtî, ne defter, ne nexşeyûn welatan û ne cîhannameya kîşweran. Mirovê ku di girtîge- heke ser vekirî de be, dîtî û ramanê wî, bi sînorê biçûk ve girêdayî ye. Em mirovên biçûk bûn, dîtî û ramanê me jî li gorî me biçûk bûn. Karên ku me dikir jî biçûk bû. Her roja diçû ev cihan biçûktir dibû. Car caran ez di cihana bavê xwe diramim, cihana bavê min jî, ji ya min ferehtir û dewlemendtir bû. Cîhana bavê min xwe digi- hande dora Mêrdînê, xwe digihande dora Cizîrê, xwe digihande piştî Nisêbînê. Cîhana min, bi zivîrandina cîhanê re, her diçû biçûk dibû. Niha di nava sînorên dora Helexê û dora Dalînê re diçe û tê. Gelek caran ez newêrim ji Ehmedê Dalînî biçime Serê Avê. Cîhana min hewqasî teng bûye. Lê wer ji dilê min re bêje. Ez nikarim. Ku dil kurmî bû, têngahije, têngçûnê napejirîne. Dilwêraniyeke ne diyar hemberî me hebû, ku me nizanîbû em çi dikin. Di nava têngçûneke bê wate de diferfitîn. de digevizî hebû. Ew qersivî dihiştin. Em faqirê xwedê hemberî wê jiyane bê çek diman. Lê, me xwe dixapand. Kesî bavê xwe ne dianî 1 bira xwe û tiştê ne digot. Hesenê Horê ku her şev di odê de dibû

him-hima devê wî û ji aş û bajar dida hev, bilî gotinên çaqlokê jinên gundiyan û gotinên vala, şewtilî, gotineke şîretkarî ji devê wî demediket. Ya herî baş Mamê Şehîn dikir, qet ji ber tifika xwe dût nediket. Havînî li ber berberojkan rûdinişt. Biharî li ser zurikan xwe dirêj dikir, Payizî di nava kalik û şîniyân werzan de bû. Zivistanî li ber tifika xwe, bi pisîka xwe re rûdinişt. Parîk nan hebane dixwar, nebane digot bi rojî me. Mîna Tiralê Bexdayê, li bin dara tuwa di hewşê de xwe divezîland û heya êvarî yariyên xwe bi jina xwe ya bav Fileh dikir. Ne serê xwe bi kesî diâşand û dilâşî ji xwe re çêdikir. Mamo û Hesên, birayê hevûdin bûn. Bê çiqasî Mamo, Tiralê Bexdayê bû, pêça xwe ne dida karê cîhanê, Hesên jî hewqasî belakir û sergerdeyi dikir. Destên xwe diavête her tiştî. Te kîjan kevir ji erdê rakir ba ye, Hesên dibin de bû. Siphan ji navê Xwedê re!.. Ew mixloqat!.. Kurmik û kêzika nava axê bû û ha ha ax serûbinî hevûdin dikir. Ji kar û tevdana civakê têr ne dibû. Hesên carinan gotinên ji 'mishefa pîroz' digotin, carinan jî hinek gotin ji devê xwe dipekandin. Kesî jê bawer ne dikir. Mirovê ku alî be, teref bigire, çî rast bêje, kes gotinên wî bi tiqul na pejirîne. Bi armanc û payeti berdide.

Hesênê Şehîn ku dilşad bane nemerdî nedikir digot:

-Em palê gû ne! Em dibezin, tiştê dikevê ber dasa me em teksîr nakin û rojê sê dana diçine ser ting û piştê kevîran dirin, ku em li piştê xwe dinêrin, tilmek gû li duv me dimine.

Em palê gû bûn birazî. Binêr, li firaza me binêr!.. Perê kefenê min di berîka min de nînin û ez hê jî li devê daire û qereqolan bi ezbenî û ezgorî û ezxulam karê xwe didime meşandin. U qumandar ew in, ez perûtkê serê çend garûte û bêzarên gundî me. Bû çî!..

Te dêhnê xwe daye xanî û mala gundiyan. Eger te dêhnê xwe nedabê wan, vê carê ku tu çûyî gund dêhnê xwe bide xaniyan. Hewşa gundiyan teva heye. Hewşa gundiyan bi kevirên rêzê hatine dorpêçan. Teva sênckirî û deriyên ahenkirî li ber wan in. Di gumanên wan de xwe diparêzin. Bi gumanên wan di nava ewlekariyê de ne. Nizanin ku hewçên dorkirî, dîwarên sênckirî şemirandina wan e. Tu qesr û qonaxên min nas dike. Bi dergehêkî zemanî û ahên pêçayî girtî ye, her çar hêlên wê girtî û avahî ne. Lê, em di nava şemirandineke wilo de ne ku bavê min ji mirina zîندانan xelas nebû. Mala pismamên min di malatowê re derket. Hewçên bi kevir û kilsê hatine pêçan, avahiyên ku paceyên wan bi dirabeyên hesinî hatine girtin, nikarin me biparêzin. Ez ji sergomê ne parastim. Li pêşiya berên topên ku xummên û himmên bi ser gund de dibarîn, nebûne mertal. Me bi kirin û finasan, xwe şemirandiye. Mirovê dîl be, mirovê bende be, her dem şemirandiye. Hewçên dorkirî, dîwarên sênckirî, deriyên ahenkirî ku li devê dergehên me hene, me ji rastiya me diparêzin. Devê derî û paceyên me yên dirabekirî li ber Roma Reş vekirî ne. Kêlîka ku Dursun Çawuş hat û hespê wî li binya gund hirriya, ew gundiye ku dikaribe dergehê xwe bigire, paceya xwe asê bike kî ye? Jin û mêr, xort û zarok teva derdikevine derve. Heddê bavê kê ye ku di hundurê de bimîne. Ew kîjan mêr û cengawer e ku dikaribe nekevê rêzê.

Dursun Çawuş, şûjina di çavên me de bû.

BERTÎL Î RUŞWETA ÇELO

Çeloyê Gêncî, ne tu nas dike?

Mêrê Xanimê ku digot, şekirek bi çerxîkî, pazdeh şekir bi ribekî...

Li ser bendera piştî Qesrê, kîjan ji wan bû hew tê bîra min, giliyê mamê te Osman kiribû. Piştî gilê keşif, naa, qeda bi deruwê bikeve,

cendirme hatin. Ew bêbavê Dursun Çavvuş ku serî zuwa diqu-sandin, li hespekî nêr, qemer î şemûs suwar, sê cendirmeyên suwarî li duv, hatin gund. Rast û rê çûne ser bênderê û gazî mamê te kirin. Bangî muxtar kirin. Tê bîra te Şerroyâ Dîn î kurê Lahdo hat û çî got. Kefa mista xwe danî ser devê xwe û tîrrên ji devê xwe anî û bangî gundiyan kir.

-Zirt û pirt, zirt û pirt ku hun li ser navika xwe dibirin, dibêjin em axayê vî welatî ne, axayên gundê me serkêşê cîhanê ne, neferekî qun bi riqa dikarê we teva. We teva bikê rêzê, qeşmeriyen xwe bi we teva bike. Zirt û pirt... Zirt û pirt... Qeşmer hemberê teresan e... Dursun Çawuş le nêrî û bi Tirkî got:

-Ne diyor bu eşşek oğlu eşşek.

(Çî dibêje ev kerê kurê kerê)

Muxtarê ku li ber romiya kabokên wî dilerizîn:

-Dclîdir Æumandarim. Delîdir, ne söylediğini bilmiyor.

(Dîne ew fermandarê min. Dîn e, çî dibêje nizane.)

Bû tiqt» la kenê Lehdoyê Dîn û her du destên xwe li hev dan, li dora xwe çû hat, destên xwe bi muxtarê kimizî ve kir, destê xwe bi gundiyan xizan ve kir û dest pê kir:

-Haaa, haaa muxtarê dînik, jê we ye ku çavvîşke qirik zîxankî û pîjaq werqîlî, Kurdî fam nake. ‘Ero biyyêmo”, çêtir ji min û te bi Kurdî dizane.

Kurdî dizane.

Çend gundiyan êrîş kire Lahdoyê Dîn, çend kulmisk li nav ser û guhên wî dan û ji wir dur kirin.

Lahdoyê Dîn bazda çû serê ziyareta Kêlo û beramberî gundiyan got û beland.



-Zirt û pirt, hun jî dibêjim em axa ne... Zîîîîqqq, hun jî dibêjin em zilam in... Zirt û pirt 'nek niyêmo" hun jî dibêjin em serkêşê eşîran e. Piiiivvvvt, çiiirrttt neferekî qun bi riqa bi we tewtye. Muxtarê dînik, li ber romiya dibê çêlîkew û zîxanka semitî... Here here serê dîk û mirîşka jêke û bide Sarika jina xv". ku ji çawîçkê qirik zîxankî, pîjaq werqîlî re biqelînê. Lawo hun gurê Lahdoyê Dîn in. Ahaaa ev quloçê we teva...

Lahdoyê Dîn berê xwe da gundiyan û bosta xwe vekir û li ser dawa xwe danî, bi çemçoqê xwe diaxivî. Bi zimanekî têr yarênî got: - Mineta we teva li ser milano.

Çelo bezî mal û kursiyek ar." zembelîş jî danî ser kursî û kire bin quna Dursun Çawuş. Dursun Çawuş li ser zembelîsê ser kursî rûnişt û gundî teva li hemberî wî bûne rêz. U dest bi girtina îfadeyên aliyan kir. Piştî axaftin û îfade xelas bûn Dursun Çawuş ji cihê xwe rabû, li benderê geriya. Xwe ji koma gundiyan hinekî dûr kir. Heya bi serê benderê, kevirên mezin çû, Çelo pê de qedimî, ji darî çavên me teva ve destê xwe kire berîka wî. Weke Lahdoyê Dîn digot, Dursun Çawuş işke qirik zîxankî, pîjaq werqîlî, xwe li tixûbê benderê miştixûland û hat.

Hew me dît Dursun Çawuş şeqamek bi mamê te Osman ve zeliqand. Mamê te hay ji xwe nebû, bi firîqênîya şeqamê re hejiya, metroyekê pekî wi aii.

Hun çend xort li ser rêza kevirê Bêndera Hecî Derwêş rawestiya ' Êro biyêmo û nek niyêmo: Bi zimanê Süryanî sixêf in. hier du gotin têne yêk wateyê. Ez di dayika derewînan bigêm.

bûn. Çawa Dursun Çawuş şeqam di mamê te werkir hun cewciqîn, ji hev vetixirîn û li keviran tewiyan. Gundiyan di we anî der, li we hilatin, gotin haa haa, na kuro na, emanet ha, hunê çi bikin, na naaa,

we bi keviran daweriqande Dursun Çawuş û romiyan. Gundî çikçikîn, ber bi we beziyan, haaa haaa haaa, dengê xwe li we kirin, kuro na, kuro na, we nemerdî nekir, çawuş û romî dane ber keviran. Gundiyan bi xwe nexweş kir. Heya bi hinek ji pismamên te... Xwe li ser dewletê kirin. Gundiyan teva, heya bi muxtarê gund digot: 'Hun hemberî dewletê radibin . Gundî ji rastiya xwe ditirsiy Rastî hun bûn, lêbelê em di nava xeftanê tirsê de razayî bûi fanosa dilê me ku bi awayekî pirr xedar û derfehatî hatibû tefandin kesî pênedixist. Mîna mirîşka ternir ternir li me hatibû. Zarok serê mirîşkan dikine bin çengên wan û bi destên xwe li nav milên wan didin, di teptipînin û dibêjin: 'Ternir ternir, bavê te mir, dayika te mir, tu dengê xwe bike tu jî mir.' Em mirîşka ternir ternir bûn. Me qîma xwe bi gidîtiyê anîbû. Şeqam ba ne, di qereqolê de lêdan ba ne, bi bertîl û rûşwet ba ne em di xanîkê xwe de distirîn, gezek nan dixwar. Lê, hemberî hev, em cengawerê mezin bûn. Di berberî û dijberiya hev de, kesî ji kesî ne dixwaj. Ku berberiyê dest pê dikir, gundî dihatin hemberî hev, ê weke Yahqo, li ser doqikê xwe 'sed zilam' dinivîsî, yanî doqikê min, xwedê giravî ew, bi sed mêrî ye. Hemberî neferê cil şînik, zîxanka peritî û çengo kirî bû.

We guhdariya gundiyan nekir.

Diber romiyan re, peya, ji bo gilî, we da ser riya Midyadê. Qasimê Mistefê jî, da ber we re. Dizanim ku wî dilqewînî didane we. Hingî jî 'muxenneti kete dilê gelek kesan ji me, ku gundiyan bînin hemberî hev, weke ferezendê bû, du-sê mirov hatin cem min û ya dilê xwe gotin; 'vê ferezendê ji destên xwe bernede' ango ez biçim Midyadê û giliyê malbata we bikim. Min nekir, gundî li destên we bûn, ez ketî bûm. Di civakê de bûyerên biçûk, gelek caran derfetên mezin derdixine hemberî mirov. Çend kevirên ku we di Dursun Çawuş û

neferên wî werkirin, gelek tişt di pey xwe de dianîn. Min dikarîbû malbata we teva pê suçdar bikim. Min nekir. Kurmê berberiyê, di serdilkê min de dijenî, di nava laşê min de mîna gêrikan diçûn û dihatin. Ezî çî bikim birazî destên min dibin çengên min de bûn. Di jiyana xwe de min ferezendeyên wiha beletewş bemedane. Min sud girtibû ji vê çendê. Sala gonê bavé te çûbû Binya Xetê. Li vegeerê fotografê Haco bi xwe re anîbû, bi dîwarê oda xwe ve daleqand. Qesra kevin bi bircik ku niha marné te Osman, xwediyê şeqama Dursun Çawuş tê de dimînê. Sîxurên min li Qesrê hebûn. Jinebî li gund pirr bûn û xwe şahîk dikirin, min awira xwe ji wan re dişikand û ré dikirin, çî dibû, çî ne dibû handin min. Min bihîst ku bavé te fotografê Haco bi dîwar xwe ve daleqandiye, di cih de min gotin gihande dewletê. ht;

mala wî oxilme kirin, bavé te birin ifade kirin, şevêkû di îti çavan de hiştin. Dawî bertil da xwe xelas kir. Çî serê biraziyê xwe ne ûşînim, min darbeya xwe bi çî awayê be diavêt.

Qolincên tewrênekî di laşê min re çûn û hatin, lê mefer nebû.

Bihesibîne bê kurmê zexeliyê çiqasî zexim û jêhatî ye.

Kes derdê min nizane. Birazî ku ne bi dewletê ba ne, min nikarîbû qarîşa pismamên xwe, qarîşa Kurdan bikişînim. Ew li ser binge- heke saxlem û kûr û dûr rûniştibûn, yê ku ji ber maka xwe pekî, tenê, ji keriyê kozê veqetiya bû ez bûm. Bavé min mina paşayûn bê terfi û nişan, ji me re mal û mewdan, tekyana mezin ne hiştibûn. Qefteke xencerê, quredareke şazîbamo mîrata me bû. Mina berxika mijoker... Gurê har li dora min bûn, ku min li ber xwe lep nedane, wî min parçe parçe bikin. Ev bû dilsotiya min. Ev bû nexweşiya min. Zan zanê birazî...

Ne hewqasî hêsa bû!..

Ku zor û tirsaw dewletê nebane, min hêza dewletê nedane piştaw xwe, min ew darbeyên dijwar û jî nişkê de ne avêtibane xelkê, kes li min ne dibanî. Ferezende mê ye, carekê tê fahliyê. Nake ducar, eger te zemt kir, te girt, xelas, eger te ne girt, pey nekeve, çû.

We, bi çend keviran rewşa me, keliha jiyana me ya xapokî dihêrivand. Ew keliha bi bircik ku bi tovê tirsê, revonek, diljenî di nava mêjiyê me de hatibû awa kirin, we dinamit dikire bin û diteqand. Em jî xwe ditirsiyan, ne jî we, jî hejarî û keşkuliya xwe. Tirsaw di dilê me de em diguvaştin. Em, jî nûjen de avakirinê ditirsiyan. Binêr ez jî te re bêjim: Heft-heşt caran avahiyên Mala Osman, bi destên dewletê, her car bi berên topan wêran bûne. Heft-heşt caran... Heft-heşt nifşan, ango heft-heşt bavan... Tu fam dike, her nifşâ ku rabûye avahî awa kirine, hêlîna xwe jî nûjen de çêkiriye. Bi tirsaw ku careke din wêran bibe. Li Tora Hevêriya ked giran e, bi berdêl e. Çiya caris in, kevir û axa wê caris in. Ji bo avahiyekê kevirên rêzan gerek in û kevir karekî zor û têr xwehdan dixwaze. Lat û kûçên ku bi mezrebe, qeraw û sefînan dihatin şikandin, bi çakûçan dihatin neci randin. Îcar kişandina wan jî barekî giran û karekî dem dirêj dixwest. Piştî keviran dar gerek bûn, kolana bingehê xanî, heya bigihane hîmên latî pêwist bû. Kils pêwist bû, nikar pêwist bû. Axa gulokên girêdana dar û banê wê, gelek caran ax jî bingehê dihate kolan, derdiket. Lêbelê kils!.. Di avahiyan de kils bi destxistin, yan divabû pereyên te hebin, yan jî tu bibe hevparê hêtûnê û şewitand- ina wê. Pâşî qonçala hêtûnê tê kolan, piştrew hêtûn li ser qonçalê tê avakirin û piştrew ardu tê amade kirin. Ardu ew dar û devî û çiloyên li dora hêtûnê ne ku bête birrîn û li ser hevûdin bibine mil. Milên hatine birrîn û amade bûn, derdorê du-sê mehan bendeyî hişkbûnê dimînin. Piştî ku çilo hişk bû, rojekê du rojan ew mil li devê hêtûnê

têne nijinandin. Bi sedan, bi hezaran milê çilo ku li kêleka hevûdin dibine rêz. Li vî rexî hêtûnê, li rexê din î hêtûnê... Du çaviyên hêtûnê hene, li vî alî û li aliyê din, rojhilat û rojava, ji bo ku çilo xotî hinduriwê qonçala hêtûnê bikin, agir berdinê, da ku ew kevirên hêtûnê ji binî heya bi serî bêne şewitandin. Piştî şevêk tê kifşkirin, di wê şevê de gundî xwe berdidine devê hêtûnê. Palûte ye, kes nabêje na, her kes, kesên dikarin kar bikin, jin û mêr, zarok, gundî bi yek carê diçine palûtê. Wê şevê ji bo gundiyên ku têne palûta şewitandina hêtûnê, çend sewal, pez yan jî conega têne gurandin. Xort û mêrên li xwe ewle dikevîne devê hêtûnê û çiloyê hatiye berhevkirin xotî hinduruwê hêtûnê dikin. Agir li serê hêtûnê gurî dibe. Mîna kûra hesinker û kûra cêran, agir li serê mitikê hêtûnê dileyize. Jinên keskûn li xwe ewle dikevîne ber xwarinê, mêr dikevîne ber şewitandina hêtûnê. Ev alîkariya civakî ye, şeva hêtûnê palûte ye, di suxrê de zexelî çênabe. Her kes misuxre, her kes barê dikevê ser milên xwe radike, her kes ji dehma xwe de dibezê. Piştî sê-çar mehên din Lu hêtûn sar bû, kils amade bibe.

Dora nikarê tê. Nikar ji cihên mîna Qulika û Cimika ku kevir û lata wê şil û nikarokî be derdikevê. Axa spî ye, kevirên ne stewihayî ne. Madena axa ku bikêrî çêkirina cebla avahiyan tê ye. Kişandin û peyda kirina nikarê jî çendekî dikişîne. Ji xwe li herema me avahî zivistanan nayêne çêkirin. Wilo bi hesibîne ku avahiyek di du salan de encex tê ava kirin. Tirsax cemawerê me ji avahiyan ne tenê birçîbûn û koçberî ye. Kurd bi rûmet û xîret destên xwe venakin. Wêrankirin hêsa ye, avakirin zor e.

Tirsax me avakirin bû, em bikêrî avakirina wargehên xwe nedi- hatin. Ji ber çî? Ji ber ku me nikarîbû wargehên ava jî bi parêzin. Mirovê

ku nikaribe bi parêze wê çawa ava bike. Tirsa me ne tenê avakirin bû, parastin bû.

Tiştêk ji mirina ji tirsa, wê mirina nav lê nehatî kirin pîstir, çepeltir û gemarîtir nîne

Hiseynê hemnavê min, aqilmendê her du cîhanan, piştî qesr û qonaxên wî dibin berê topan de man, bi bazara koçberiyê û rûşweta kêsek zêr ku da qumandarê Roma Reş, kir ku berê topan dane qesr û qonaxên min jî, qesr û qonaxên min bi yê xwe re miştin, li ser riya çûn û nehatinê, ya revê, li ser riya reva Binya Xetê, ku ji ber şibaqa Roma Reş xelas bû, wiha got: 'Bi xiyanetê re jiyan çênabe, me Kurdan mala xwe bi vê nezanînê xera kiriye, em mêrên hev, pis pismamên xwe bi destên dewletê didine kuştin, em xiyanetê li hevûdin dikin, qesr û qonaxên hev bi topên dewletê dikine şikêr, piştê li hev tên, li kêleka hevûdin rûdinin. Çênabe. Ev bi xiyanetê re bi aşîti jiyan e. Pêwiste ku tov û bizrê xiyanetê bête qelandin. Quncir û zîwana di nava genim de eger neyê neqandin, savar û nan jê çênabe. Bêjing û serada civaka Kurdan, rojekê berî rojekê bête hejandin, yê ketin bin, yê mane li ser... Hingî em Kurd dikarin bigihin armanca xwe.'

Hiseyn ez û hevalbendên min, zîwan û quncira nava genim dihermartin.

Me ev heq kiribû, car din kesî berê xwe neda me. Kî dizane, belkî ji wan ne dihat, hew dikarîbûn. Lê çawa, dikarîbûn, dikarîbûn, her roja xwedê nijdêvanên wan li van derdoran bûn, dikarîbûn ji nişkê de bavêjine ser me teva, bi zar û zêçan ve bikujin. Xelefê Mala Xeco, ji bo sê-çar bizinên hît, ê mala Seferko kuşt. Dikarîbûn berê xwe bidine min, ne kirin. Ne dikirin. icar şîreta ku ez li we bikim: Şere hemberî dewletê giran e, efû kirin, têbûrîn çênabe... Di şerê

neteweyî de dilkeçikî, dilpenahî çênabe. Hun nekeviixeletî û  
şaşîtiyân wiha. Ev filankes e, dostê bavé min e, min nan li mala wî  
xwariye, filankes marê di tur de ye, ewletî pê nabe, nekin.  
Meremên bavên xwe, kalên xwe neyinin cih. Emanet û qiyamet,  
emanet û qiyamet... Meremên ku bi tovê nifşê me hatiye çandin,  
neçin ser xelkê. Rastî me, ev çend heq kiribû. Pismamê wî, ango ez,  
di kêle- ka qumandarê Tirk de runiştibûm û topê qesr û qonaxên  
wan bi ser hevûdin de dihêrivandin. Bavé wî, ku min digotiyê  
'mamo' di wê kêlîkê de hate kuştin. Êdî Qarîşa Reş ji erda xwedê ket  
û hêza xwe, aqilê xwe teva da ser tohildanê. Dawî ya xwe bire serî  
û tola xwe bi kavilkirina qesr û qonaxên min hiland. Em bi sê-çar  
bavan ji hev durketibûn, ku em liqasî hevûdin dibûn me navê hev  
hilnedida. Em pis û kurmamê hev bûn. Me digote hevûdin kurmam,  
mamo, birazî... U me pişta lingên hev, çalika xayinan dikola. Me  
berê topa Roma Reş dida hevûdin, zar û zêç di nava agirê topan de  
dibiraştin. Roma Reş qesr û qonaxên me kavil dikirin, bav û birayên  
me dikuştin, me serdilkê xwe difirkand û 'ohnaaay' dikir.

'Ohnaaay' a me ji valahiya qoqê serê me dihat.

Weke lîstika bizdimbadim û ohnaya bizdimbadim bû!..

Valahiya serê me mezin dibû, fereh dibû.

Valahiya navbera pismametiye fereh dibû.

Valahiya navbera gundîtî û cîrantiye fereh dibû.

Çiyarêz û deryayên bê serî û binî diketin navbera me. Gelo hinek  
kes wê derbikevin ku dikaribin vê valahiya fereh dabigrin û Kurdan  
nêzîkî hevûdin bikin? Pûçahiya navbera pismametiye, pûçbûna  
navbera cîrantiye û gunditiye û pûçbûna qoqê vala ji holê rabikin?

XewnekeL

Ku bête cih baş e!.. Xewneke di nava gumanên şikestî de ri:

Kab û xara xortê gundî winda bûne, lê diğere nagere nabîne... U morîkên keçika gundî winda bûne şev û rojê lê digéré nabîne. Binfiskiya ewanan zêde bû, ne kab û xar dihatin dîtin, ne morîkên keçika çav şerbitî. Şikestîk fereh bûye. Birîn xedar e!.. Ne tenê birîna xencerê, dewsa gotinan, şikâren kavi, ku di bûne cih û warê mişk û maran.

Nifşâ me, nifşâ min û bavé te, ji nûjen de avahiyên xwe ava kirin. Careke din dil nadin ku avahiyêriibi keda xwe ava kirine wêran bibînin. Xwîna wan e. Hinekî mafê wan jî heye. Tirsa ku Roma Reş kiriye dilê wan mezin e. Mafê me heye ku em tirsonekî bin, mafê me heye ku em ji rastiya xwe birevin. Rastiyê sud nedaye me. Rastiya me serdestî me ye. Em xwe ne xapînin. Hemberî rastiye em çîz bûne. Kewê çîz bû, hew dest dihilîne. Hew dixebxibîne, hew dibêje qebo, qeqebo û bi xurrîne... Çîzên ji qirika wî tê û dizeriqe. Em jî, ji ber Roma Reş dizeriqîn, bêyî ku çîzên ji qirika me bê. Ji xwe, em nikarin weke kew birevin jî, em dimelisin, serê xwe dikine bin bask û perré xwe û 'ternir ternir, bavé te mir dayika te mir, ternir ternir, ku tu deng bike tu jî mir.' dileyizîn. Temir-temir bûye tovê jiyana me. Ku mirovan got em çîz, tiştê li meydanê namîne.

Pevçûna kewan seyr e. Ku kew ketin zîqa hev, pâşî xwe gums dikan, serê xwe radikan û li dora hevûdin dizivirin. Gulpika xwe diwerimînin û xurrê dikan. Te şere kewan dîtiye birazî?.. Qet serê xwe danayînin, her dem serê xwe mîna hespa kihêl radikan. Piştê hêdî hêdî nêzîkî hev dibin û ji nişkê de xwe didarine hevûdin. Her du basik, bi bafîka ku himmet û hêzê bidine xwe, perrên xwe vedikan û li hevûdin dixin. Gurreke bi hêrs didine xwe û xwe di nav ser û guhên hev werdikan. Sîng bi sing diçine hev. Piştê mil didine hev û bi nikila şer dikan. Heya yek stuwê yê din bigire. Kê beri yê din



stuwê hemberê xwe girt ji erd dihilgêve û dixwaze di ser serê xwe re zerki, aliyê din bike. Kewê ribat rê nade, xwe bi erdê ve dizeliqîne. Di melise, bi neperûşk û kulabên xwe bi erdê ve dizeliqe. Rê nade ku kewê hember, wî di ser serê xwe re zerki bike û bikê tat. Hew te dît kewê xerab hatî zemt kirin, ji nişkê ve xwe hilweşand û qirika xwe ji nava kelbêtên nikilê wî xelas kir û pê pê re xwe çendî qirika wî kir û beri ferezendê bistîne, xwe bi ve bizeliqîne, ji dehm de hildide û di ser serê xwe ve zerki hêla din dike, icar rewşa me ew e ku kewê ribat Roma Reş e û em Kurd yeko yeko, kê serê xwe hilda ye, bi qepira wî girtiye û ji dehm de hilda ye, di ser serê xwe ve avêtiye, çiz kiriye. Kelbêtên nikilê Roma Reş tuj û dijwar in. Mirovê ku di nava kelbêtên nikilê Roma Reş de darbe xwar, hew dikare bi qabqibîne, hew dikare bi

Rastiya me ev e.

Rastiya ku em jê ditirsin û jê direvin.

Min bî xwe pişka xwe ji aliyê dewletê ve avêtiye. Heya îro pişka min baş ketiye. Bili roja gonê, li Amedê û gotinên Mistefa Kemal Paşa pê de. Wî teresbavî darbeyek li min da, darbeyek li min da giraniya wê, xedariya wê, şewta birûska cihê wê, qolincên têr tevzînokî bi ser dilê min dixê.

Pişka min Rorm

Pişka bavê te jî çarenûsiya sexelî ya Kurdan ketiye...

Me Kurdan, Kew jî xayin kiriye. Binêr, tu gelê din nêçîra Kewan mîna Kurdan nake. Kurd Kew digire û dike rekihê, êm didiyê, kuli- han jê re berhev dike didiyê û piştê dibe çiyê, bi sehriya sibehî re li ser dar dideynê, yan jî li ser ferşik û dora Kew davikan radixe. Hawîrdorê Kewê li ser ferşik davik dike. Ew jî kozikekê çê dike, xwe vediçêre. Kewê reben dixwîne, diqebqibîne, bang û hawara

xwe dike. Kewê tenê ku dîl bû ye, bangeke hawarî dike ku cîhanê dirakê şipe. Kî dizanê çi dibêje, gelo hawar û gazî dike ku bên wî ji davikan xelas bikin, gelo dibêje. Li bextê mirovan ewle nebin, ez dîl girtime, kirime rekihê, hey ji xwe hebin. Gelo bang dike, gazî dike ku bi hawara wî bên, kes nizane. He w te dît Kewên ji xwe razî û qayil, mêrxasên ribat, ji nava refên xwe qetiyar û gur li xwe dan, hatin dora Kewê ku dora wî teva bi kemîn û davikan pêçayî. Çe caran dixebxibînin û diqebqibînin û xwe çend dikine cem. Kev hawarê hatî xwe di nava davikên şimakirî de dibîne, dîl Kewê ser ferşik xwe dixwe, bi nikilan radibe xwe, Nêçîrvan jî radibe, ji kozikê derdikeve û kewê di nava da digire, dike tûrik.

Kewên ku li çiyê bi ref û di nava aşîtiye Kurdan xayin in. Kurd ji berbetanê ûrê dişibihînin Kurdan. Kurmê xiyaretê 1 rebenî belengaz çima. Ya dilê xwe dil dîlbûna di dilê wan û mêjiyê di nava azadiyeke bê sînor de li pîşya hevûdin nakolin, hevûdin çengo nakin, giliyê hev nakin, ixbara hev nakin, rêzantiya nêçîrvanan jî nakin, naçin destê mirovan nagirin û nayînîn nava refê Kewan, jiyana wan wêran nakin..

e ye, Kurd xayinê nifşê xwe ye.

Têhnika me miza cixarê ye. Agirê cixarê çiqasî dikare te ji seqem û serma Zivistanî biparêze? Pêdiviya gêra li bersiv û şîroveya vê pirsê nîne. Her tişt vekiriye, her tişt diyar e. Parçeyek, yek parçe bi tenê, ji dîroka Kurdan, ji bo tâghiştin û fêrbûnê bes e. Firaze va ye, mîna neynikê hemberî me ye. Em xwe dixapînin birazî...

Mêvanên bê hêvî ne em.

Mêvanên ku dihatin mala Hemedîno, ku teva bê xêr û nano bûn. Mêvanên dost bin, ne kurê roja xwe bin, mîna Tirkan nanê wan ne li ser kaba wan be, rabûn û rûniştina ku mirov dibê wan de bike beletewş naçe. Tirk kurê roja xwe, kurê nanê xwe ne, kêlîka derba wan hat li nav ser û guhên te dixin. Em Kurd jî fêrî tişte nebaş kirine. Dêhnê xwe bide Kurdên me, sed carî ji wan re bike, sed carî di ber wan de bibeze, yek carê ku li gorî dilê wan çênebû tu ne baş î. Sed carî û carek... Ev ne xisleta Kurdan e. Ev rastiya ku em jê direvin e. Ji dibistan û medreseyên berê tişteki me nemaye. Tore di nava sikêran de herhilî ye. Mîrata me jî winda bû ye. Di nava kav- ilên dîrokê de rizî ne. Me hey ji xwe nîne. Mîrate û firaza dibistan û medreseyên kevnare xisletên ciwamêriyê, rûmet û xîret didane ber me. Ew medreseyên ku Ehmedê Xanî derxistine, Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyra derxistine kanîn? Yek ji van nemaye, teva winda bûne. Nav heye, qaçilkê vala li hemberî me ye. Qaçilkê vala mîna qoqê serê me, yê vala ye. Qaçilkê vala, dengê bê wate derdixe. Kodika vala... Valahî her dem nexweş e. Boş e!.. Valahî tovê pûçbûn û zingarê ye. Pirzikên nexweşî û tozika rizandinê ye.

Hemedîno, Xelo Xisirî bû. Ga dida bi golik, çêlek dida bi berxik... U ji hawhawa xwe ne diket. Digot ez bazar û qaçaxê dikim. Kesî li devê deriyê wî malmîratî çar pez, du dewar ne dîtin, kesî du ga li devê deriyê wî ne dîtin. Ne ai çalê de av hebû, ne di kuwarê de dexl. Rez û werz ji xwe çênebûn. Roj nebû ku deh suwariyê dora Licê ne li mala wî bûn. Hemedîno di ber wan re diket û radibû. Belengaza jina wî her roj tenûrek nan çêdikir. Lêbelê pirr balkaş bû ku rojekê ji roja xwedê pêşîra Hemedîno ne giha hev û ne got, ohnay li vê kêlîkê/Bi vir de dibezî, bi dera din de dibezî û ji deynan xelas nebû. Roj hat ku Hemedîno, deyndarê waqas mêvanên ku dihatin mala wî ye.

Nezanîn birazî, nezanîn zor e. Valahiya serê Hemedîno ew ji rê dixist û riyeke vala, armanceke bê wate dida ber, nizanîbû çî dike. Hemedîno û mala Hemedîno ji zin-garê xelas nebû. Te xaniyê wî dîtiye, tewla hêspê kalikê wî bû. Piştî ku qesra kalikê wî bi topê hate xerakirin û bizrê wî bû Hemedîno, di nava valahiya serê xwe de bû gerhokê belengaziyê, nikarîbû qesra bavê xwe ava bike, di tewla hêspê bavê xwe de rûdinişt. Kes nedî ye!.. Çawa kur li bav zêde neke! Qey tu nizane ku tovê waweylê, dîloka 'Uyan e dilê min Uyan e' ye. Civaka ku kur li bav zêde neke, ew civak mirî ye. Gelo kî ji me ne Xelo Xisirî ye?

EM IF ARE BÛN,

JI ME WEYE KU EM BELETE NE

Tiştên ku ez dibêjim, tenê rupelek ji albuma jiyana min e.

Tenê yek rûpelê di nava dilê helisî de mayî...

Rastî dema bavê min hate girtin ne em bi tenê, bin kêna ku xwe dabûne derdora bavê min jî sêwî mabûn. Xewnên bêxeyal dest pê kirin. Jiyanêke dilşikestî em pêça bûn. Ne em bi tenê, pismamê min jî, ku me berê xwe dabû hev û destên xwe kiribû pêsîra hevûdin, ew jî di nava dilekî helisî û şikestî de dipûnijîn. Elîk hatibû kuştin, Hiseynê hemnavê min girtî bû, Haco nizanîbû serê wî li ser çî balgihî ye. Ew û Osmanî di zîqa hev de bûn û ha şer dest pê kir, ha dest pê kir. Dilê xirbeh û kavlên Tora Hevêriya ji bo şerekî nû, çarkopal lê dida. Xelk, êdî ne digiha cotê fio^e bike, rezên xwe rake û kesax bike, tiriyê xwe biqurêfê, di avê dake mewîjên xwe miştaxe bike, helîl û bastîka xwe çêbike, benî û berankên helîlê darvebike. Cihikên kahriwên û şivanan ku di nava şikêr û dîwarên tibarên de bi strî,

dirrih û puş diseyardin, weşiyên tirî yên gulgulone di hin- duruwê cihik de di nijinandin ji ber çavan winda bûbûn.

Matemetîk û îstatîstîkên ku hejmara gorîstanên bê kêl winda kiribûn, bi xwe re ne digihan ku rûpelekî din, nûjen vekin û pênusa ne tuj kirî li boyaxa duxana findikan bixin, pitik û gotinan rêz bikin. Her du beşên zanistî ku dest dabûne hev û destûbiraktiya xwe, digel cîhaneke aram de daxuyandibûn, qîm nekirin û bi qaydkirina hejma; û reqeman westiya, movikên telî û destên wan qurimîn, reviya çûn. Lewra, li gastî û meydankên dora gund, xirbeh û kav-ilên Tora Hevêriya dinêre, seranser gorîstanên bê tirşe mezin in, gorên wan bê kêl in. Tenê Hiseynê Mala Horî ku di serîhildana Taqa de hate kuştin, li ser kêla wî 1339, li gorî salnameya hicrî nivîsîne. Roja gonê ku 'nefiram'a Osmaniyan hate ser Haco, şerekî dijwar dest pê kir. Ji wê rojê û vir de, çerê her du basikan ranewestiyaye. Elîk hatibû kuştin, Haco dewsa wî girtibû... Ê şer berdewam bû...

Her du basikan hurik hurik amadekariya xwe dikir û her du basikan jî ne dixwest hevûdin bicewibînin. Jiyanêke bêdeng û fet- sînokî, têr tirs... Kexesên jî pirr bûn. Meydana kexesên, dema mêr li meydanê nebin fereh dibe, yên mîna Heştê hespên xwe dibezînin. Elîk mêr mîna mirîşk û zixankên çengo kirî didîtin. Roja ku hate Mizîxê, bavê min gundî li hev dabûne hev û bêôfia gund bi wan dida paqij kirin. Bavê min li ser dîwarê zeviya raserî bêrme li ser balgihekî runiştibû û palûta bêrmê dida meşandin. Elîk di berbanga xortaniya xwe de hat û hemberî bavê min rawestiya.

Bavê min ew cewiband û got:

- 'Elîko birazî rahêje bêrê û alîariya gundiyan bike. Bo gundî nebêjin teva xwe li ser serê me a kine mezin.'



Aimanca bavé min ew bû ku li darî gundiyan Elîk bidê kar kirin. Eger Elîk rahêjê bêrê û kar bike, mezinatiya mamê xwe pejirand, mur şikestî bû, di çavên gundiyan de şikest, êdî axatî, mezinatî pê nabe. Bawerî pê nabe. Elîk, tâghişt, tê ne ghişt, bi nav têdanê hinek kesên din, hew dizanim, ji bo hemberî mamê xwe deribeke daw û delingên xwe çik-çikandibûn û hatibû. Armanca Elîk jî ew bû ku dijî mamê xwe rabe, hemberî gundiyan dengê xwe bike û bêje mezinatî ya min e.

Elîk bersiva bavé min da û got:

-Mamê delai. Eger tu rahêjê tevir, ezê rahêjim bêrê.

Kevir û heste li hev diket.

Çirîskên agir, di nava gotin û galgalên dijberî û cewibandinê de dipekîn. Keskûniya dijberî difûriya.

Gotinên Elîk, kursiyê bavé min hejand. Rabû û ber bi Elîk çû. Cewibandina kursî û tacîdariyê dest pê kiribû. Du serî di beroşeke de ne dikelîn. Çawa bavé min ber bi Elîk çû, Elîk xwe çend kire ser û guhên marné xwe. Icar bavé min gir û zexim bû, Elîk kin û dagirtî bû. Lé caris bû. Hemberî gundiyan hevûdin circirandin. Elîk bi guhê bavé min girt û bameda. Heya xwînî kir. Roja hêrivandina bircikên dilê malbata mala Osman dest pê kir û heya weke roja îro didomîne. Kevirên qulqulkî û xirêmokên nava hêrikên beroj û mesîlan, kolan û zaboqên guhên gundan li me teng bûn. Dergûşûn pîrebiyan di nava heydênîyekê de mane li gastînan û Elîk bi ser alaya Seyar ya Midyadê de girt, got Midyat wê bibê payîtexta tacîdariya min û nobedar berdest kirin û şerê bê dawî û encam da dest pê kirin.

Hêlê dest pê kir. Bavê min ji rexeke ve, Osmaniyan ji rexeke ve, çem û çoganên xwe bi destên xwe girtin, bi nav û ser û guhên berşanê Tora Hevêriya ketin.

Dê weladê xwe avêt.

Piştire, Elîk Cimoyê Farisê feqîr û ku±^ wi,

Cimo, hate xapandin, qumandarê Tirk, piştî bi xap û rîpan Haco II. ji çiyayê Mava daxistin ■' berdest kirin, dengê xwe li axayên dora xwe kir, yazdeh, duwazdeh axayên ku li ser navika xwe dibirîn, digotin ez û ne tu kesî din, ku digotin quloçên min di erd û ezman nahilin, qurmê simbêlên xwe bi hinetîtkî rudêna latan sor-geverî dikirin, qerepaçê li bedena cizmên xwe didan, ku dimeşiyar mîna ciwanîka nû pêketî serê xwe diqerastin, stêrik dihejmartin, li ser şûr û rima wan mohra dewleta Al-î Osman hebû û pesin û wesfên xwe bi sintaqiya piştgiriya dewletê dikirin, li dora qumandarê Osmanî bûn, kesî dil nekir, kesî destên xwe neavête qurmê simbêlên xwe û newêrabû ji hespê xwe peya bibe, destên xwe biavêjê qefta xencerê. Newêrabûn, piştî wê kezîkurî hebû, piştî wê seyr-û sefera kûdand- ina toi hildanê hebû, newêrabûn gîrrê xwe di Mala Osman bidin. Mala Osman, hemberî hev bin jî, ya xwe nadin bi ya xelkê, rîya xwe nadin, li ser hevûdin dixeyidin. Dawî!... Ne ava Kanîzerkê bû, xwîn bû dirijandin. Ne karxezalek bû digurandin, Haco II. ku di nava refê Mîrê Bota û refê Şex Ubeydullahê Nehrî de cih girtibû, ku piştî têkçûna Şex Ubeydullah, heft salan di Çiyayê Mava de ma asê, hemberî Osmaniyan serê xwe nedanî. Ew Haco bû ku heyfa Simayilê bave Çelebi bi tefandina heft ocaxên malbatên ku ew der- fehatî kirin neanî û kişûmat ocaxa wan tefand bû. Padişahê xelîfê ola îslamî, mîratê Yawuz Selim ku bi şurê xwîna 'Ehlil Beyt' jê diniqûtî, xeftanê pêxemberê axir-zeman, rediyellahu li nav milên xwe kir,

serê wî xwest, berxwedana xwe domand. Girgirekên li dora qumandar dengê xwe derneyêxistin.

Kî ji mala Ternir bû nayê bira min, devê xwe kire guhê Cimo:

-Mêraniyekê bike, navê te wê li cîhanê teva bela bibe, heya cihan ava ye wê bêjin Cimo serê Haco yê Hesenê ku heft salin li ber Osmaniyan di çiyayê Mava de şer dike, jê kir. Dengbêj û stranbêjên Mala Kinê wê şer û stranan li ser te bêjin. Soza mêrê berê ezê keça xwe bidime te. Her roj ferezende nakevê destên mirov.

Gotinên ajotinî, di serê Cimoyê ku heya wê rojê, bi Haco II, re hevalbend bû de rûniştin. Ji hespê xwe peya bû û xwe da pêş. Fermandarê Osmanî li girgirekên din nêrî, teva serê xwe tewandin, Cimo ma li hember ku rahiştiye qefta xencerê û ber bi Haco diçe. Dema Cimo xencer danî ser zengelora Haco, Haco dengê xwe li Cimo kir:

-Kurê Hacîra korik, xelk mêran di wir ve na gurîne?

Cimo behitî ma. Rebeno heya wê rojê, dev ji mêra berbide, kahrik û berxikên xwe bi kes û kûsan didane gurandin. Ji ku dizanî mêr çawa têne gurandin. Ji deşeli û mêrxasiya Haco hêbet girt, du gavan berepaş bû. Haco ku dest û lingên wî bi zincîran girêdayî, stuwê wTTele kiri, li ber kêrê bû, şurâ melkemot û ezraîlê her du cîhanan, ku ketibûne xwîna tuxmê pêxemberê axir-zeman, ew Osmaniyan ku bavê xwe birayên xwe dikuştin, di ser serê wî re dihejiya, nemerdî ne dikir, bê tirs diaxivî.

Cimo bi dengekî diljenî:

-Haco, min mêr ne gurandine heya ku ez dizanibim. Tu dizane, bêje min.

Haco, bi awireke şikestî li Cimo nêrî:

-Mêr ji piştta stikurê ve têne gurandin.



Fermandarê Osmanî giha armanca xwe, serê Haco di nava bexçî- ka heft rengî de pêça, kire xurcezîna xwe, ku bibe li ser tepsiya zêr bike û li dîwana padîşahê xwe danî. Xwîn kete navberê. Kesî bawer ne dikir, kesî bawer ne dikir ku serê Haco hatiye jê kirin, heya Xezmê, dayika Gewriyê û jinapa Melkê, ku sala fermanê, weke Fileh dibêjin seyfo bi serkeşen Mala Osman re girtin û birin girtîge- ha Xerpotê, Gewriyê bi Hemed re li wir nexweş ket û mir, Xezmê ya Zazî, ku ji Peyruza Deywanî bêhtir bi axatî bangî^cwe a>ir destên xwe mîna axayekî ku li navika xwe bibire, destên xwe dipa-land, li Zazê fermandarê payebilind bertîl kir, rûşweta çilûdu zêr danê û li nava bexçîka heft rengî nêrî, dît ku serê Haco ye, ji nû bû heydênî... Semyanê Mala Osman mabûne Hemed, Mamê Kal ku roja gonê hate kuştin û bavé min. Hemed yê rûniştina odê bû, qet demedikete derve, Mamê Kal yê fesil û navbeykariyê bû ku hê jî dibêjin fituhat li ser rûwê wî heye, keliha berê xwe bidayê safî dikir. Bar mabû li ser milên bavé min. Gurikê şer û talan û berberiyê bavé min bû. Ser jêkirina Haco kete qonaxa tolhildanî. Bavé min, Çelebiyê ku niha ez nizanim gora wî li kuderê ye, Cimo heft salan xwînî kir.

Xwîn kete nava dostên qedîm...

Ku şîrê hingilê xiyaneta aşûfte herikî, gol û bîrên dilê mirovan tejjî kirin, Xwedê ji ser rûwê erdê, bi koçberiyê heydênî reviya; wargehê xwe bire qonaxê ku mirov nikaribe bigihiyê, tenê bi bazara têr efsûnî dikaribe lê bibe mêvan û tenê bi keser dikaribe awira xwe bi ser de bişikîne rûnişt. Rûnişt û hew rabû... Ji mirovan dûr ket. Xwedayê ku ji nava ferfitandina jiyane dûr ket, çarenûsiya di nava şîre hingilê xiyaneta şûfte de xeniqî, ji bîr kir.

Jiyan qeşîtî, mirov qeşîtî hiştin...

Ew zanabûna bê sînor y a Tirkan careke din rola xwe, ya li ser têtên Arpa Babîlonya leyist. Kurd, qenc û xerab li ser teliya xwe leyizandin. Qemûşka şimadana dilan careke din derizî, xwîna di nava bizrê nezanînê de pingihayî weke arava heft rojî, bi ser keşkûliya rojê de ziravik rist û herikî. Cimo û Haco dostê hev bûn, yek bend û yek rêz bûn. Cimo û bavê min gelek caran ketibûne zîqa hev, bend û berberi hemberî hev dikirin, lê ew û Haco, na... Ji bo bikevê çavên dewletê, belki ji bo kevnika zeriya wî axayê dilewênî, xwe kire cawê sifir ku haveynê axir-zemanê sedsala bîstan pûç kir. Hêviya gurrî, korîk kir, tefand. Xelatên bi destên zîvkerên telkari sazkar kiribûn, pê re pê re şikandin.

Kesî heya îro jî bersiva çima Cimo, nedaye... Aqil!..

Heya îr,, \* ew xwta H,\* „.Mye, dMre, ji

masetê nehatiye hilandin, kesî dil nekiriye ku we xwîna li ser 1 atik û beltikên dilan pingihaye, qemuşk ne girtiye bişo. Piştî Osmaniyan, Îttîhadî hatin, ew xwîn dix" ia,.din, xwîna mêran difûre, wan jî ha ha agir gurrî dikirin, piştî Ittîhadiyên ku bi navê Tirkîti bangî xwe dikirin hatin, xerabtir kirin, tujikê hewdelê gerandin, fesadî kirin, navbera her du basikan fereh kirin.

Dijmin ji me bi aqiltir e, dur diramê, fereh dizivîre. Dijmin hûnermendiya wêraniyê, tefandina ocaxan, hilweşandina desthilatdariyan xweş dizane. Ew dijminê ji tuxmê qerezalimên ku ji serê mirovan minare çêdikirin, bilî zwîn rijandinê ji tiştêkî din fam nakin. Lewra dibêjim ji me bi hiştir û zanatir in. Bi ser jêkirina Haco yê Hesenê, giha armanca xwe. Kelihek safî kirin, bend û suri- ha pâşiya . we rakirin, serê wî li ser cifniya zîvî kirin birin saraya Mutesarifê "êrtê, ji wir jî biriin dîwanê, diljeniya Padîçahê xwe ji holê rakirin,

ew aram û kêfxweş kirin, doza xwîna ku bi sedsalan \1?Ukme kirin nava Tora Hevêriya.

Dijmin du armanc dabûne pîşiya xwe û di her du armancên xwe de serket.

Elîk du mêrên Salîkî. Maksoyê Kulî û pêne mêrên din bi xwe re birin û li Çalika Isa, kete pîşiya Cimo û kurê wî. Cimo bac û beşa dewletê dida hev. Xelata ku dewletê da Cimo 'katibiya gundan' bû.

Elîk berî bi rojekê agahî standin û kemîna kuştina tolhildanî, li Çalika Isa danî. Çawa Cimo û kurê wî hat li ser danî, bi hêstirê da erdê. Maksoyê Kulî jî li ser kurê wî danî. Elîk êrîş kire ser laşê wî û destên xwe avête xencerê, di ser laşê Cimo re rawestiya, Cimo li hişê xwe bû, bi awireke şikestî li zîlamê xencer di destan de û di ser serê wî re rawestiyayî nêrî û pirsî:

-Birazî tu kê yî, xwezî min tu nas bikira.

Elîk, bi dengekî tolhildanî:

-Ez biraziyê beranê ser jêkirî me.

Cimo, awira xwe şikand û bi dengekî melûl:

-Mafê te heye birazî, mafê te heye.

Cimo de pêça, bi dengekî dilzarî: 'Keska ocaxa Seyit Bilal e, doza di navbera we de çiyê nizamim, lê xwîna lcu dijmin rijandiye bila nebe kelih û bircikên tolhildanî, xwîna 'ehl-el beyt' bes e, serê Cimo jêneke, bide xatirê ocaxê.' Elîk, Seyidê rêwingî neşikand, ji bo nîşaniyê xencer avête guhên Cimo yen bi guhar, jê kir û ji ser laşê wî bû rast.

Fişeka kor û derziya kûh li nava xirbeh û kaviên Tora Hevêriya hiştin û bi xencereke ku Ocaxa Seyidê rêwîngî yê avzel kuh kiribû guhên wî yê bi guhar jê kir û bir di dawa jinmama xwe Zeynebê de danî.

Agir fereh dibû, navber fereh dibû...

Qolinca reş fereh dibû...

U mirinê pesnê xwe dida..

Dema min dikarîbû rahêjim tivingê, garuta xwe li dora min da hev. Dostê bavé min ku dixwestin li lut û pariyan bigerin, li dora min gihane hev. Bavé min riyeke şikestî û têr qesewat dabû ber min. Riyeke ku ji rastiya min dur bû. Rastiya ku bavé min jê ditir- siya. Min nikarîbû pê de biçim. Lê ew barê giran, barê dil helisî ku bi salan ez û birakên min, ez û dayika min di nava perîşanî û bêçaretiyê de guvaştin dihate ber çavên min. Sevên tejî xewnên giran î bi têba, ku bi ser min de dihêrivîn dihatin bîra min. Bircikên dilê min ku bi ser hevûdin de dibûne şiker, hêrikên hişkeber ku di nava hinavên min de çêdibûn, zext û zoreqe neqam li min dikirim Dostên bavé min jî, mîna bavé min ji rastiye direviyan, ditirsiyan. Dostên bavé min, destên xwe dane rastiya ku em her du basik jê direviyan, bi çengê min girtin, wilo hêsanî, berê min dane devê dergehê qatilê bavé min.

Berê min dane devê deristanê ku eskerê wan ez birîndar kirim, bi ser birîndariya min de, di nava derfehatiyeke mezin de girtin ser mala min, ez raçengî xwe kirim, ez kirim ber şibaqa suwariyan, di nava buxzeke tolhildanî de berê min dane Burdurê, wargehê sergomê.

Roja ku ez çûme devê dergehê qatilê bavé xwe, muré min şikestin, serê min tewiya û stuwê min xwar bû. Cewherê dilê min derist, fanosa dilê min tefiya, kurmê iledarî hêlîna xwe di kûraya dilê min de çêkir. Ew dilê birîndar heya îro jî li derman diğere. Ez bûme palê bêxîretiyê. Xelasî ji wê rewşê çênabe. Heya îro jî ev kul- malî li pâşiya min e. Rastî hêvîyên min hebûn. Hêvîyên ku ez kurê Heyderê gavan bikime bin tunê xwe. Şêxo, Beko û Miradkê Keşê bikime bin

rima xwe.^Min qet bîr ne dibir ku ew, ji xwe yê min in û her roja xwedê dibin çengên min de ne, bikin nekin palê rûmeta min in. Hêviyên şikestî bûn. Hêviyên ku di nava remedîlka serê tin- gan de gemarî bûbûn. Destpêk kevzê bû, dawî teqan bû. Kurmî û iledarî bû. ~:,~eşî fereh bû, ez pêçam. Di navbera min û pismamê min u bavê min û Elîk danîn fereh bû. Bircik û bedena di <erS min û pismamên min de, bi destên dijmin hatibûne ava in, qalin û bilind bûn. Ez û dilê xwe bûne dijminê hev. Roja ku oxanê li ser dilê min, bi bêbextiyeke dijwar hate kuştin, min ala tolhildanî ber bi ba kir. Ez û mêjiyê xwe, ez û şîrê berê dayika xwe bûne dijminê hev. Berê min û rastiya min ketibû hevûdin. Şerekî dijwar, şerekî man û nemanê dest pê kir.

lingên min qeydûmerbetkirî, dilê min kelepçe kirî, ez şibaq bûm û li duv bave xwe dimeşiyam. Xwîna bavê min li erdê bû, bê kes û bê kus li xerîbiyê, bi dilekî şikestî û melûl, ez di nava xwîna bavê xwe de bi gevzekî li xwîneke din digeriyam. Piştî li xweşiya min hat. Firazê xuya kir, tama bez, ked û xwehdana min kete şikefta devê min. Dilê min hêdî hêdî bi xwîna heram û gemarî dihate seyandin. Destên dewletê li piştî min bû û ez her roja diçû bi hêbet û mezin dibûm. Jinan milên min diramîsîn, mêr û xortan destên#iVn diramîsîn. Gotinên Sadun Beg, gotinên Bînbaçiyê Kurd yê artâşa Roma Reş, di nava benîştâ jiniqa Qereçî de dihatin kurkusandin. Min ji dewletê paye standin. Ez û hogirên li dora xwe, bi kirin û kiryarên xwe serbest û azad bûn. Edî em kurê dewletê 1 >ûn. U destê ku dewlet jê bike xwîn jê nedihat. Di bin xwedê re dewlet hebû.

Dîrok dûbare dibû.

Xwîn, li serê çiyayê Bagokê difi

Bagok fereh dibû.

Keliha Bagokê, bi beden û bircikên xwe mezin dibû. Keliheke bê dergeh. Birrên mêranjicomên âşîran diketin wê keliha bê dergeh û demediketin. Kûra Zerzemîn bû ku mirov, lawir, dar û devî bi hevûdin re, ax û kevir û dil û têhnika jiyane bi hevûdin re diqurpandin. Ha ha, ha ha diqurpand û têt ne dixwar.

Zirtên vala, gotinên pesindanî li dora me bûn. Em di nava xewre bezê xwe de dipêçan. Pesnên mêranîyê ketibûne bin kaboka me û bûbûne zembelîşê beralika me. Qurçik û anîşkên oda bi civat û civînan hime-him jê dihat, ji pesin û zirtê vala tejî dibûn. Xewnên şevê li me çûbûne gilî. Bêyî zirt û pesindanên vala jiyane ji me re nemabû. Cîhanek hatibû ava kirin, cîhaneke rengîn, lê xwediye wê cîhanê ne em bûn. Cîhanek xenîqoyî, em dixeniqîn, dijmin dixeriqî. Agir dibarî û em di nava wî agirî de qijilî bûn. Hajê me ji me nebû. Ez serekçete bûm.

Serê koma ku bi tiving û cebilxaneyên dewletê xemilandî, bûn. Top û cebilxaneyên ku pêşî qesir û qonaxên pismamê min wêran kiribûn û piştê berê xwe dabûne qesir û qonaxên min, dawî bavê min di nava lele û zincîrên xelek mezin de pêça bûn, biribûne riya çûn û nehatinê. Min kelihek li ser xwîna bavê xwe. Li ser xwîna pismamê xwe, li ser xwîna gundiye xwe ava kiribû. Di bircik û odeyên wê keliha bê ban de hor-hora me bû. He w birazî, he w birazî!.. Dewleta Roma Reş bûye bav û birayê kîjan Kurdî.

Û dewletê dest danî ser dil û mêjiyê me. Em malê dewletê bûn.

Dewlet û Bagok ketibûne zîqa hev...

Dewlet û Mizîzex ketibûne zîqa hev...

Tevnepîrka xiyanetê dilê min di nava xwe de pêça bû. Ez û kela dilê birîndar î têhnik ne şikestî, hemberî hevûdin bûn... Ez û toi- hildan hatibûne hemberî hevûdin. Min nikarîbû qatilê bavê xwe, bi rastî jî min nikarîbû, firaza pismamên min darî çavên min bû, wêranî, koçberî û mirin di firazê de çavên xwe beloq dikirin, lewra min êrîş dikire gundî û cîranên xwe. Gund di xemgîniyekê de dibir- ijî. Têhna min venedişikest. Zevî di nava wêraniyeke bêxwedî û xwedan de diqijilîn. Têhna min venedişikest. Darîstan di nava hejariyeke pepûkî de diwerivîn. Têhna min venedişikest. Kit nema, temtelus ji ber himbêza agir xelas nebû. Di nava du salan de, ez dikarim bêjim, eger mirov li îstatîstîkên Ereban ku di nava keşkûliyeke bê wate de girtine, derdorê bîst hezar kesî hatine kuştin. Ev hejmara îstatîstîkên pirtûkên Ereban, ji Amedê heya bigihe Cizîra Botan ku qirkirina Eleqemşê ne di nava wan de ye. Îstatîstîk û matematîkê hesabê xwe şaş kiribûn. Coxrafya di nava pêtên agir de dikire qîrên û gazî. Ê ez serekçete bûm. Kîna min hebû. U kesên ketibûne zîqa min ne binbarê xwîna min bûn. Ez bê çi gelo!.. Ez bêjim tolhildan bû, na. Ez bêjim doza xwînê bû, na. Ez bêjim doza kursî bû, na. Ez bêjim ne bêjim xêr nake. Bilî hewqas mirov, bîst hezar mal ocaxa wan tefiya bû. Ez bêjim doza tacîdariyê bû, na. Min dikir û Roma Reş dixwar. Têr ne dibû. Xwînê têhnika wan venedişikand. Tî bûn. Birçî bûn. Ne goştâ mirovan ew têr dikirin, ne xwîna mirovan. Gundek bi tenê li ser piyan nema.

Serekçeteyên derdoran teva di rewşa min de bûn. Teva, serekçete teva dibin rima min de dibûrîn. Ji sedema ku serkêşên hemberî dewletê pismamê min bûn, bêyî min kesî nikarîbû qarîşa wan bikişîne, teva xwe li dora min didane hev. Lê na, gelek ji wan bi serekçetetî bûne xwedî kursî. Dewletê destên xwe da piştê wan,

hemberên xwe têk birin, meydan ma ji wan re. Bûne axa. Bi xwîna pis û pismamên xwe, bi xwîna gundî û cîranên xwe bûne axa. Mezinahî û dewletbûn bê xwîn nabe. Dewletbûn xwînê dixwaze, hunandin û girêka li derzîdanka dewletê dikeve, mîna şurê ahenî bi xwînê tê avdan. Gelo bêjim ez bûme dewlet? Naa! Ew fiqêna hildênîka Ittîhadiyan ez ne kirime tiştek, ez puç kirim, vala kirim, mîna paçikekî ji hev de ketî, ez avêtime gastînka ber mala me. Çi nîrxê paçikê ji hev de ketî hebe, nîrxê min hewqasî li cent dewletê heye. Ez û zirt û pesinên xwe ligel dewletê bûn. Ew dewleta ku piştî destek û alîkariya bavê min ku Elîk ji wan re kuşt, pâşiya wan vekir, kelem û astengên pâşiya wan wejartin, ToraHevêriya ji wan re safî kir, li tişteki nemanê heyirî û bavê min girtin, stu lele kirin, dest û ling zincir kirin, birin. Min aqilê xwe ne kire serê xwe. Bavê min serê eşîre bû, kom radikir û hêzên dewletê didane duv xwe, min çend garute dabûne dora xwe û bûbûme serekçete. Çetevanî ne karê min bû. Lê, rastiya min ku ez diguvaştim, ez dinava hêza xwe de diperçiqandim, jiyana min belqitand.

Dewletê rê ne dida ku cetevaniya min pareke baş ji xwe re bibe.

U ez bibim xwedî tacîdarî.

Dûr û kûr diramîn, rê ne didan, ez bi hêz ne dikirim, çawa hebe ez ji Malbata Osman bûm, çawa ewletî bi bavê min ne dianîn, bi min jî ne dianîn. Wan dabeş dikir û pareke biçûk ya min bû.

dewsa bavê xwe de bûbûme axayê luta. Dora min bi kujan hatibû dagirtin. Ji min weye ku teva dost û yar in, niha ji wan li dora min nîne. Çima ji ber ku lut xelas bûn. Qopanî nemaye. Tişteki ku bi saya min bidestbixin nîne. Edî li çariyan û sikakên Midyadê ku liqasî min dibin, berê xwe diguherin, naxwazin silavê bikin. Ji xwe re dibêjin, guman dikin ku silavê bidin, ezê tişteki ji wan bixwazim.



Axayekî bê xwedî û bê xwedan.

Xwedî ji min dur diketin. Xwedayê min, ji min dur diket. Her roja diçû bêhtir ji min dur diketin û ez dimam bitenê. Kesê ku bê xwedî û xwedan be, nikare bibe axa jî. Lêbelê zirt û pesindanên ku anîşk û goşeyên oda min didagirtin, ez rêve dibirim. Zirt û pesindanên vala bûbûne rêzanê min.

Tu jî dizanê ku hemberî qesra min valahiyeke ku zeviyên xet bizêr heyê. Zad û dexla ku dihate çandin, bûbû alifê suwariy Roma Reş. Ked û xwêhdana gundiyên min, xwîna jin û zaî gundiyên min di devê hespên romiyan de mabûn. Em min; mirîşkên ferfitî li wan dilehayî diman. Me çav bi wan de zûr fikir, guh çeq dikirim Fişke fişka pozê me bû ku me newêrabû bigirîn. Kahrik û berxikên me li ser sifra wan bû. Şîr û mastê me, nivîşk û hingivê me di devê wan de bû. Qatilê bavê min bûn, qatilê pis û pis- mamên min bûn, qatilê min bûn. Xwîna min rijandibûn. Ew qesra ku bi topa dewleta Tirk hatibû hêrivandin, min ava kir. Bi kevir û kuçên qesrên pismamên xwe ku bi aynî topê wêran bûbûn, min qesr ava kir ku qatilê bavê min tê de runr

Û ez rêzan û dewsgêrên wan bûm... Min ne dixwest ku agirê Bagokê bitefînim. Agir çiqasî gurî dibû, ez mezin dikirim û hinekî dişewitandim.

Şevbûrêkên me, ku heya berê sibehê didomandin, di nava agir de derbas dibûn. Zirt û pesindanên me jî di nava rimî û pêtên agir de dişewitîn. Dilê me dikewitî, me hey ji xwe nebû. Ax û av di nava hevûdin de ^ikv h\_, . Germahiya rastiya me, em di nava kirasê sorgevezî de diqijilandin. Rimiya agir li serê banê hêtûnên dilê me gurrî dibû. Hinavên me diçiqçiqîn. Şeva me nebû, roja me ne ya me bû, heya ku me Bagok safî kir. Sedûbîst rojên kalenderî agir ji serê

Bagokê xalî nebû. Keliha Bagokê bû şikêra Mêran. Bacolî, mêrxasên mîna Gundor di nava wê de peritîn. Dasikayên ku di sala 1915 an de ketin ber şibaqa Osmaniyan, bûne kêlik û nîşangeha top û mozoliyan, di nava wê de pelixîn. Şemika, kişûmat di nava pêtên agirê Bagokê de qijilîn. Rayîtî mal bi mal di nava agirê Bagokê de mane qersivî, heya îro bi xwe nehatine. Pêtên agir ji Xerabêalê diavête Sêderî, ji Arboyê diavête Xerabêmişka... Zarokên ku îro ji dayikên xwe re dibin têhnika wî agirê mezin di kûraya dilê xwe de dibînin. Bi tirseke neqam çavên xwe vedikin. Xirîq xirîqa tirsê, talan û wêraniyê, tirsî mirin û girtinê dikin. Deşt û newal, beroj û nizarên ku bi xwînê hatine şîştin kulîlkên xwînê vedikin. Zarokên ku bilitik dibin, kulîlkên xwînê berhev dikin. Bilbizêk û gulbijêrkên didine hev, di rengê xwînê de ne. Avzêmkên di quntara çiyayê Bagokê de, ew avzêmkên di serdilkê zinaran de dipeqin, pâşî xwînê dizeriqînin. Warê Lokman Hekîm ku bi zihayê maran re li derman û nefela çar pelî digeriya, rê û şivîleyên xwe winda kirine. Xewa şevê di nava têba û kabûsên xwîzîkî de hatine pêçan. Beruwê daran bi xwînê dagirtî ne. Guhîj û belalûk bi xwînê tejî ne. Kura Bûkê ye.

Bagok îro jî Kurra Bûkê ye.

Di nava wê qcrqçûnê de min nîşaniyek stand.

Agirê Bagokê ez jî şewitandim. Ez bûme Axa. Ez li ser kursiyê bavê xwe rûniştim. Bi destên qatilê bavê xwe, bi destên ku ez birîn- dar kirim û heya niha ez kuloke me, li ser kursiyê bavê xwe rûniştim. Kursî ne yê dewletê bû, yê bavê min bû û dewletê tun li min dikirin ku wan ez li ser kur..i runandime. Tacê li serê min, kur-siyê dibin min de ez kor û kerrende kiribûm. Axayê dibin tunan de û kuloke... Piştire piştire min dêhnê xwe da derdorên xwe, ez di rewşa xwe û eşraf û paşazadeyân li guhên bajaran runiştî û bende- tiya dewletê

dikirin, aram û xwedî tekyan in, ramîm. Heylooo, medeke dur û dirêj di navbera min û wan de heye. Wan medeke dûr û dirêj standiye. Ez li paş marne. Efendiyê mala xwe ne, efendiyê çarçî û bazaran e. Ez li ser pişta hespê, li gund û çiyar digêrim, ji bo rêkûpêkiya dewletê ku serê dewletê ne âşâ, şev û roj digêrim, gundan dişewitînim, gundiyan feleqe dikim. Ez bûbûme peyayê dewletê. Dewlet li mala xwe rûniştibû, ê ku dibezî ez bûm. Min weke wan eşraf û paşazadeyân sîxur, tişteki ji dewletê ne stand, her min didayê. Hew me nêrî ku eşrafen Mêrdînê hatine Nisêbînê û Berriya Xelef Axa di nava xwe de parvekirine. Hew me dît ku eşraf û paşazadeyen me, yek bi yek bûne karmendên dewletê, serê anîşkan teva girtine. Hew me dît ku eşraf û paşazadeyên guhê bajaran xwe dibêrin namzêdiya parlamento rakirin û careke din li ser serê me bûne beg û begzade. Me kir û em mane li derî sifra tirşike. Ez bi destên eskere Roma Reş, ji paça xwe birîndar bûm.

Birazî ev seqetiya min nîşaniya Dewletê ye. Ne nîşaniydn paşatiyâ, ne nîşaniyen qesr û qonaxan e. Tişte ku li min zêde bû, navekî wêranî, payeke şermokî, berziyeke poşmanî, û hew. Piştî ku Bagok safî bû, Mizîzex kete destên min, gundî û dîlzarên di destên min de mabûn, xwediyê zirt û pesindanên vala, diçûne serê banan û bangor bi ser banê avahiyar de diberdan. Qesr û qonaxên ku xwehdan û xwîna xelkê di nava kils û risima wê de rijiya bû, wêran dikirin. Avahiyên ku dilê xelkê di nava sênder û kevanên sîwana deriyê wan de raza bû, bi destên pismaman, bi destê gundî û cîranên wan dihatin wêran kirin. Ew gundî û cîranên ku%aerî çendekî bi hevûdin re li civatan rûdiniştin, li berberojkancivat girêdidan, li nava zevî û rez û werzan bi hevûdin re karûbar dikirin. Bi hevûdin re diçûne hêlê, bi hevûdin re diçûne hawarê, bi hevûdin re diçûne aş û

karwaniyê. Şîn û şadûmanî bi hevûdin re dijiyan... Agirê bi xwînê dihate xwedî kirin ketibû navbera wan. Du mêran dirahişte bangorekî hildidan û ji dehm de berdidane ser nîvê banê avahiyê. Çend mal wilo xera kirin. Çend mal qulqulkî kirin, baran û berf û pêlên qeşayê hunandina bi kevir û kilsê ji hevûdin bedidand. Wêraniyekê dest pê kir, êdî kesî nikarîbû pêşiyê lê bigire. Keleka me ji hevûdin feşgilî bû, her parçekî dar û meşkên pifdayî, qetên werîs û şelitên şidandinê bi deverekê de çûbûn. Em bûbûne cîranê xirbeh û kavdan. Şermezariyâ dora me pêça bû. Tewanbariyê em di nava xeftanê bêrûmetiyê de dil kurmî kiribûn. Bêhn û bixara kurmî ji me û derdorên me difûriya.

Navê zarokan hatibû guhertin.

Navê deşt û newalan, navê guher û mesîlan hatibû guhertin. Êdî guher û mesîl û zinar û çiya bi navê şikêrên mêran, bi navê xwîna rijihayî dihatin bi nav kirin. Mextel, ango şikâra Behdê, Guhera Gozê, Şikâra Mamedorê, wargehê bêbextî û telaqreşiyên, Guherka Kuştîyan, Diyarê Topê, Kemîna Dilê Jarê, Latika Mihemedê Kuco ku xwîna wî heya îro jî li ser wê latikê ye, ne baran, ne berf û ne dewsa mirovan dikare wê xwînê bişoyê. Nav, bi giştî hatibûne guhertin.

Tolhildan...

Kirasekî heftrengî û hêstir Li ser lêvên pîrebiya ber dergûşe Di nava hînkahiya dilê wê de U qolinceke reş î tîr çîrîzokî U dîkê gundê bê nav yê heft birakan Diqîriya û hawar ber bi ba dibû

Pîrebiya ku dergûş dihejand Navekî bêdeng û tirsonek diloriya Navê te tolhildan e lawo

Argûniya çavên zarokê Bi berê tivinga qundax şikest, Agir ek pêdixist, agirekî fer <

Û lorandina pîrebiya dayikê Mîna guharekî heyderî Bi morîkên qetiyayî ve darvedikir

Agir fereh dibû, navber fereh dibû...

Qolinca reş fereh dibû...

U mirinê pesinê xwe dida...

Tu dizanê ku ev gotinên min teva navê poşmaniye diqîrin?

Kelhoşka dilê min dixumihe. Birîndarî, dilsariya di nava xeftanê nêçariyê de razayî, bêdeng mayî, zor e birazî... Hestê dilê min, ceweherê dibin nalê hespande şikestî, çirîskan nade û hinavên min diçiqçiqin. Tişte, êdî tişte nema vedigere, çû, me berda. Ne kuştî, ne koçberî, ne wêranî, ne fanosa dilan ku berê topan hatiye tefandin... Riya vegeerê li ber me winda bûye. Reşbiniya dilê me em xeniqandine. Tişte zor, tiştê wêranî ev e. Roj tarî ye û heyva çardehan bi darî min nakeve.

Evîneke bêbext û bê birhan..

Birazî, raste ku sitirihê poşmanan nayên. Ez çiqasî bêjim, çiqasî bibelînim xêr nake. Gotin baqê nîska ye. Gotin ma li paş, kirin bû navnîşana me. Kirina wêranî û weke ku hun dibêjin, xiyanc Xiyanet çiqasî kotî ye. Kotîtî hêlîna xwe di dilê me de çêkir. Gelo emê dikaribin ku rojekê vê hêlînê xera bikin? Wê dermanê vê çendê peyda bibe? Kurm ketibine birînên kotîtiyê, mêjî xera dibe. Jiyanê demarî derdikeve pêşiya mirov. Hewldanên we, ku hun xort li mala Pîso digihine hevûdin û ji hevûdin re diaxivin wê tişte derbixê meydanê? Dewsa we, wê tozik bigire. Bavû kalên we tişte ji vê damistonkê demexist, gelo hun?

Damistonka me bi xwe di vî agirî de nîne.

Heya îro tz kûlokc me. Ev kopal ji ithnika agiré Bage\*8 rewa girtiye.

Kizîra şewata Bagokê li ser e û ez didime ber xwe. Kurmamê min ji

min re şandîye. Kurmamê min ku ji ber agirê Bagokê û şibaqa min reviyaye, binxet bûye şandîye. Kopal li dilê min dixê. Li dahola rastiya min dixê û dengekî wirîqênî derdixê. Dêhnê xwe bide movikên kopal, reşqeliya ne. Mîna dilê daxdayî... Stuwê lelekirî ku dewsa zincîrê reş-qeliya be û bi ava 'kewserê' nayê şîştin. Stirih û quloçên birrekkirî ne. Xelekên hesinî û çen- gelên polayî ji hev qetiya ne. Jiyan dibin palet û dolabên çekên giran, tanq û topan de perpitî ye. Hun ji ku hidamê ve rahêjinê wê ber bi we bê. Ji kîjan goşeyê hun rahêjinê wê di destên we de bimîne. Me firazeyeke baş li duv xwe ne hiştiye, da ku hun dikarib-in ber bi hevûdin bibin.

Dîsa ez dibêjim ku destpêk navê serketinê ye birazî.

Em ne dostê we ne. Hun rastiya me datînin ber çavên me, rastiya ku me bi destên xwe, parçe kiriye, ji hevûdin tertûbela kiriye, bi top û meterilyozan kuştiye, di goristanên betonî de veşartîye, nûjen bi fesilînin, bidirûn arzi me bikin, li bejna me nayê. Me qîma xwe pê aniye, ziyar û sûd be jî, heya niha qediyaye. Ji niha û pê de, di nava temenê li ber qonçala gorê, di nava serhildanên canbêzarî de li bejna me naye.

Ezê tiştêkî ji te bi pirsim, a niha bersiva min bide:

-Ez mamê te me, weke serspiyekî te dibêjim, ji riya xwe vege: Ne li ber min, ne li ber xwe xera bike. Tu çi dibêje?

NaaL

-Hun Roma Reş ku têra xwe bi xap û rîp e nas nakin birazî. Mîna berê, bi hezaran Kurdên fêrî ternir ternir bûne, ji bo kurtîlan mabe, ew Kurdên dewletê bav û bira dibînin wê bibin çeteyên dewletê. Zelal kirina Kurdan zor e, dev ji vê evînê berbide.

Ez û hun dûrî hev in.

<•

■y

## DILÊ MIN LIYAN E BIRAZÎ

Min serî zuwa diqusandin.

Cûzanê ku bi heste û çerxa dewleta Îttîhadiyan tûj bûbû di destê min de bû. Asil ez bûm. Bi serê bavê te, ku min Tora Hevêriya kiribane hêkekê û li erdê bidane kesî nikarîbû bêjê serê sola te bi toz e. Mîr ez bûm, dadmend ez bûm, cellad ez bûm. Got' ia min destûr bû. Ku min ferman da, bayê dilivîya pête dida, ewrê li hewa dadiket, heyva li çardeha dikeniya. Bajar û gund di ber şibaqa min de bûn. Kesî newêrabû bêyî min biçe livîna xwe. Min mêhne li xelkê dikirin, min bi derfehatiyeke mezin zordariya xwe dimeşand, erêêê, ku kesî nikarîbû bêjê serê sola te xwar e. Rijandina hewqasî xwîn, wêraniya hewqasî wargeh û gund, ew xêr û xêrat dabûne min. Cîhana ku sînorên wê ji Ava Mezin heya bigihê Nisêbînê mabû di destên min de; riya min di kiras û xeftanê berê de nemabû. Ne kiras li min dihat, ne xeftan... Kesî nikarîbû qutikekî nû, kirasekî nûtewb li xwe bike. Qîma min nedihat. Tu fam dike bê ez çi bûm, çi nebûm. Zilm têr naxwe, tixuba-, n I make. Bîra bê binî ye, tejî nabe. Çavên ku sor bûn, her xwînê dixwazin, her nalênî û xirîqa mirinê dixwazin. Mirin û xwîn dibe xwarina zordariyê. Tîr di zaliman naçin. Ji ber ku zalim bi ahenpûşî ya polayî pêçayî ne. Dilê pola ji zorê re gerek e. Tîr di pola naçin. Zor pola ye, xwedê û xwedaniyan nas nake. Ez dîkê nava sed û hin hezar mirîşkî bûm. Ew mêrên ku li ser navika xwe dibirîn, kesên ku xeftanê bêxîretiyê li xwe kirin bûne mirîşk. Yên ku li xwe nekirin tertûbela bûn, kulê wan dikorê wan re derket, her yekî li deverekê rawestiya. Binya Xetê bû kun- roviya bazdonekan. Revok teva li wir gihabûne hev û li me temaşe dikirin. Carekê diduwan ber ser me de pêl bûn, çeteyên me mîna gurên har dane

pêfiya eskerên Tirkan û bi ser wan hilketin, çawa hatin wilo vegeriyan.

Çete bûbûnê gurê har. Hestî zaf bûn, ketî û nanê di tenûran de şewitî zaf bû. Min teliya xwe bi kuderê ve dikir, bê gotin êrîş dikirin. Na tune bû. Milgiranî tunebû. Bi dilê wan ne bi dilê wan diçûne ser dozê. Safî kirin ji xwe li devê derî bû. Çi bi qencî, çi bi xerabî... Qencî nebû. Qencî bûbû zor û kulmisk. Kulmiska min di ser serê her kesî re himmandî bû. Dibêjin darbeya himandî çêtire ji ya danî. Ku te darbeya xwe avêt, sehwa diser xelkê re diçê, ew jî destên xwe didine ber xwe. Min, şîreta dayika xwe ya reben ji nekir û her dem kulma xwe himandî hişt. Ku min danî jî, dengekî mezin ji de w sa kulma min dihat.

Bi vê temtêlê me jiyaneke bi mîrekiya bê dîwan û bê şêwir der- bas dikir.

Rojekê li Midyadê Gebroyê Isayê Zetê giha min, kete çengê min,  
Bi dengekî şîretkarî û hêdîka:

-Hiseyn Axa çima tu naçê Amedê?

Ez matmayî mam. Bi dengekî heyirî:

-Gebro çi karê min li Amedê heye?

Gebro beşîşî:

-Mistefa Kemal Paşa wê bê wir. Di van rojan de... Guman dikim ku serê meha Nîsanê..

Ez bihitî mam:

-Mistefa Kemal Paşa wê bê Amedê û ya min çi?

Gebroyê Isayê Zetê, di nava ser û guhên dewletê de bû. Nêçîr dikir, gundiyeke ji rê ketî, bi Tirkî nizanîbane û pêdiviya wî bi devê daîra nifusê hebane, Gebro dikete pêçiyê, karê wî dida meşandin û çend quruş jê distandin. Arzûnameyên her cureyî dinivîsîn, li devê dozger



û daîra eskeriyê li nêçîrê digeriya. Karê wî ev bû. Ji nameyên eskeriyê, heya arzûnameyên gilî û daxawazên muxtar û girgirekên ku xwe li cem dewletê xweşik dikirin dinivîsîn û debora xwe dikir. Guhbel bû û hajê wî ji cîhanê çêdibû, ji her tiştî, ji her bûyerê agahdar bû. Gelek karûbarê me ku dikete aliyê hikûmetê, bêyî em biçîne devê daîre û qonaxên hikûmetê, safî dikir.

Dilê min mizmizî..

Kemal e Kemal e Kemal bavê me ye Wextê Kemal sax bû Nanê ceyî li me qaçax bû

Me wiha digot. Me digot û em li ber direqisîn.

Kemal e Kemal e Kemal bavê me ye

Em bûbûne mitirbê Mistefa Kemal Paşa...

Ew mîrekîtiya min wî bikevê qonax dîwana Mistefa Kemal Paşa de bikeve, ademîzadeyek hew dikarê Gotinên Ge de rûniştin.

îcar ez ketim çengê Gebro:

-Tu dîzanê kengî wê be.

Gebro ji dilekî safî û xêrxwazî:

-Erê!.. Di serê meha Nîsanê de, roja pêncan li wir e.

Dilê min lerizî.

Gebroyê îsayê Zetê, kûnekê bê heval û hogir bû. Erê dost bû, lê ji sedema ku Hacoyê duyem li ser dostê kevin Henayê Sefer, bi bavê wî Isayê Zetê kiribû, hatibû ber pîpînga dergehê me. Piştî Elik ku bi ataxî û piştgiriya Henayê Sefer bi ser Alaya Midyadê de girt, ew eşraf û begên Midyadê berdest kirin, Isayê Zetê talan kir, serê wî bi cûzanê kuh qusand, rezîl û ruswa kir, bûbû bendeyê devê dergehê bavê min. Dawî fêrî kurtîl û pariyên destên xelkê bûbû, êmnatî bi mirovên wiha nayê.

Navbera Malbatê û Osmaniyan fereh bûbû...

Navbera dil û gotinan fereh bûbû...

Navbera tun û kerdan fereh bûbû...

Wê kêlîkê min dest bi hesabê çûnê kir û di serê xwe de plan û programê çûnê lidarxistin. Coşekê ez girtim, coşekê ez girtim ku nayê gotin. Riya min di kirasê min de nema. Bêyî ku ez biçim, min bi çavekî din li xwe nêrî û lept livandina min, gotin û rengê axaftina min hate guhertin. Ezê kê bi xwe re ezê çawa amadekariya xwe bikim, te min de çûn û hatin.

Hêkeke zêr bû û bendeyî min bû.

Eger ez bi sazbandî û aqil biçime ezê bidestbixim. Ku kete destên min xelas. Pêwist bû ku mirîşk sil nebe, ne reve. Welatê me ketibû rewşeke têi gelacî. Wargehê ku tovê xîretê jê winda bûbe, bizrê qunekî, rîtalî û neciwamêriyê şîn dibe. Fesadî rê girtibû, deşt û newal û gelî dagirtibûn. Dewlet jî bendeyî wê gelaciyê bû. Li hesabê wê dihat. Ne dixwest serê kesî bi mû bibe, çavên kesî bel bibe. Kê serê xwe radikir doqik li serê wî diket. Mûrê xelkê ji xwe şikestî bûn. Dewletê bi xwe, heya jê dihat dilê xelkê kurmî fikir, çavên wan korr dikirin. Hebûna wan diqurpand. Navbera komên xelkê û jiyane fereh fikir. Sînorê ku hatibû kifşkirin, tovê waweylê bû. Gorîstan bê kêl mabûn. Kêlên ku berê hatibûne çêkirin yeko yeko şikandibûn. Ne tenê sax, mirî di gora xwe de ne aram bûn. Kesî newêrabû li saxan li miriyan, li kêlên goran xwedî derbikeve. Kesî newêrabû li ser miriyên xwe bigirî.

Dilojarê, di nava rekiheke hesînî de girtî bû.

Dahol û zirnê bi berbangê re lê da.

Ez li ser ciwanîka kumeyt suwar bûm û yazdeh suwarî li duv min

kar bûn. Bi dahol û zime, bi lîle-lîl û şînika tivingan, ji devê derge- hê qesra di ser bêrma gund re, me berê xwe da Amedê. Deng zu bela bû. Mizgînê bû, bûyer li ser şax û perê ba suwar bû, li nava Tora Hevêriya geriya. Berşanê ku ez li ser dile wan ezîz bûm, dane duv min heya bi Midyadê ez rê kirim.

Di rê de hesabek di serê min de rûdinişt, yek radibû.

Sazkariya mêjiyê min, ha ha bêhtir ji her demê kar Sazûmankariya paşerojan... Min cîhaneke nû di serê xwe de didamezrand. Mistefa Kemal Paşa mirîşka ku hêkên zêr dikir bû û ez ber pê diçûm. Weke Gebroyê Isayê Zetê gotî, gelek kerdên min di stuwê dewletê de hebûn. Min heremek jê re safî kiribû. Min serekçetevanî kiribû û kulê pismamên xwe ku dused salî av bi hes- tiyê Tirkan vexwarbûn, di korê wan re derxistibû. Bi hejmara salan derdorê dused salî Mala Osman kelem û dirrih bûn li pêşiya Osmanî û Ittihadiyan. Ji roja ku Silik berê xwe da Zaxuran û riya wî kete Tora Hevêriya, heya weke roja îro... Salek bêyî serîhildan, nifşek bêyî serîhildan ne bûrî ye. Yek sal bi tenê û yek nifş bi tenê... Bavê min dest pê kir, destê Osmaniyan girt, min domand û ez diçûme ber bi mirîşka hêk zêr. Da ku min xelat bike.

Gelek caran eşraf û axalerê Midyadê û Mihelmiyên Êstilê, ku tevahiya wan Êzîdiyê Xerabiya, gundiyên Helexê, Qartmînê Filihên Kefrê û Xerabêalê bûn, piştî bûne bajarî, di nava ser û gûhên dewletê de xwe dîtin, bi devik bûn, nikil diavêtine min. Gelek ji wan bûne memur û me digote wan efendî. Ew efendiyên ku doh û pêr li devê gastîna deristanê me, bendeyî bifermokirina hinduru dimane şipâ, niha... Çerx zivîrîbû, çerxa felekê rex guhert- ibû. Ew li pişra masê bûn, li ser kursî bûn, em, em ew kesên ku ax bi xwînê av dan li devê deriyê derve mabûn. Çawa hebe ez gundî bûm, wan

payeberziya bajartiyê standibû. Ku roj dibe ya qewamê û dûvikê meqilkê disincire, em gundî yê berz û cengê ne, wekî din, em yê duv kerê û bar û karwanan e. Weke ku Gebro digot!.. Ew xwendekarên Estiliyan ku ji bajaran vegeriyan û daîre vekirin, bûne kelem û ketin nava lingên min. Ez diçûme kîjan daîrê yek ji wan li wir rûniştî bû. Di dibistanên Tirkan de xwendibûn û Tirkiya wan baş bû. Heya min gotinek bi Tirkî digot, gotinên Kurdî ji nava lêvên min diqevistin. Kula wan ketibû ser dilê min. Min didît, diyar dibû ku ewê rê ji min bi stînin û keda min teva beletewş biçê. Xuya bû û hewceyiya bi nirxandin û şîrovû nebû. Mistefa Kemal Paşa, despêkek nû bû. Ji bo min ferezende bû. Ev ferezende careke din bi destan nakeve. Hê ez li Midyadê, xelkê ku ez û axa û girgirekên li duv min suwar dîtin, bi dilekî têr xwezî û heyranî li min dinêrîn. Hê em li Midyadê reng û awira komên xelkê hate guhertin. Beg û eşrafen bajêr bi hesûdiyeke mezin li min dinêrîn.

Hiseyn Axa diçê ba Mistefa Kemal Paşa.

. ♦ Hiseyn Axa kuşur û doqikê dewletê ye û li Tora Hevêriya, kesê ku navê Haco hildide, dibêje req û li nava her du sitirihê wan dide, wê biçê serdana Mistefa Kemal Paşa. Navê Haco û navê Kurditiyê weke hevûdin bû. Haco û Kurdîtî şelîta qirikê bû. Kesî mîna min nikarîbû van navan bi kar bîne.

/V

Hiseyn Axa, zilamê dewletê ye... t'

Hiseyn Axa, çi bêje, çi dike as li piştta wî ye. Ew neçê cem Mustai Çiya ji ber min vedikişyan. Newal û deşt ji ber min direviyan. Kevir û kuç, teyrik û tûrik, lawirên berrî, ker û lal diketin rêzê, xwe ditewandin. Dar û deviyên dilorand, ba û bergên daran di fîqand û ji kêf û evîna min re diketin dîlanê. Deng bela bû, gundê ku em

digihanê, xelk derdikete pêşiya me, bi lîle-lîl qurban ser jê dikirin, bi dahol û zirne em pêşwazî dikirin û bi aynî tenrtêlê bi rê dikirin. Nafûra dilê min ber bi ezman bilind dibû.

Şeva pêşî em li Qilitê razîyan. Ciwamêran nemerdî nekir, em bi nirxekî giranbiha li mala xwe razandin. Ne dûrî me bûn û gelek caran destên me digiha derdorên wan. Nirxekî me li cem wan hebû. Elîk heya bi wir gava xwe avêtibû. Qopaniya ku Elîk dida hev, Qilitê dikire nava sînorên xwe. Nav û dengê Mala Osman gihabû wan cihan, nexasim di şere Bagokê de, ku min ew hûner kirin, nav û dengê min bela bûbû. Sehwa min hebû. Li ser rima min axayê Tora Hevêriya nivîsibû. Ê ez diçûme cem Mistefa Kemal Paşa.

Reşîks giitibû ser erdê û em li devê deriyê mazûlvane xwe peya bûn. Xwediyê malê di ber me de ket û rabû. Êvarî heya derengî şevê civata me geriya, serspiyan gotin û belandin, xortan di xizmetê de kêmasî nekirin. Derengî şeve em razîyan û bi sehriya sibehî re em rabûn. Mazûlvane me Sûryanî bû, lê ciwamêr misîn û cilika limêjê di mala xwe de amade kiribû ku mêvanên wî yên misilman nemînin heyirî û ew jî şermezar nebe. Piştî limêjê bi bayê bezê teştîya me amade kirin, beniyên guza, helîl û bastika kuncîkirî, mewîjên zeynebî, bi nanê sêlê re di nav cilikan de pêçan û kirin xurcezînên me. Li devê derî, me hespên xwe rakeşî xwe kirin ku li gastînka devê deri suwar bibin, zarokekî nû nû bilitik dibû bi wirîqênîyeke dilêş ber bi me beziya hat û hat xwe çend kire paqa mazulvanên me. Tu nabê kurê wî ye. Mazulvan destên xwe di ser serê wî re bir û li me nêrî. -Xulamî we be kurê min e. Cêwî ne... Piştî çar keçan û temenekî derengmayî, xwedê du kurên cêwî dane min.

Me jî nemerdî nekir...

-Xwedê wan ji te re bihêle. Çi bela wî ye, bi diljeneka kevanî bi ser te de beziya.

Nû mazûlvanên me ji kurik pirs kir:

-Çi bû lawo, kê dilê te hişt?

Mazûlvanê me navser bûbû û dereng bûbû xwedî kur. Di reşka çavên wî de xuya dikir ku bi xirîq xirîqa kur re dilê wî dilerize. Her cara ku xirîqênî bi kurik dikeve, kezeba wî jî dişewite. Zaroka ku asoyê dilê wî di nava lîstîkên wî de bûn, ji girî û helke helka zexelî nikarîbû gotinên xwe seranser ji devê xwe derbixe. Bi zora kotekê gotinên wî di nava fişke fişka pozê wî re derketin.

-Muşâl xar û kabên min avêtin sobê, destên min ba da, êşand.

Rengê mêrik bi yek carê zer bû. Lêvên wî, heya bi zeniya wî 1er- izîn. Li me nêrî û li kurê xwe nêrî. Destên wî ji ser serê kurê li ber dilê wî şârîn hatin hilandin û li me nêrî. Dêhnê min lê bû. Dilê wî bi carekê sar bû.

Bi dilê sar dengê xwe li kurê xwe kir:

-Lawo tu giliyê birayê xwe dike?

Kurik ji dilekî şikestî û bêhn birihayî:

-Erê... Wî jî xar û kabên min teva şewitandin, li min da, destên min ba da.

Hê gotin di devê kurik de, lepê bav di rûdêna wî ya çepê de rûnişt.

-Xwedê tu ji min standî, tu ji niha de xwe fêrî gilî û bexîltiyê dike.

Deh caran min gote te, xwe fêrî gilî û bexîliyê neke. Here rahê quredarekî bi pinihe Muşâl, tola xar û kabên xwe jê bistîne.

Kurik bi şeqama wî re pekî devê deriyê hewşê.

Mêrik dev jê berda, hate cem me.

-Axa bibûrin, digel we min ne dixwest vê bêrêziyê bikim, lê, ji niha de zaroka ku fêrî gilî bibe, ku mezin bû jî wê li nûs nûsa ber xelkê û

devê deriyê hikumetê bigere, wê bibê kûçikê kewt-kewtê. Bila ew bikêrî xwe be û li ser xwe bixeyide, ne ku hawara xwe bigi- hînê yên ji xwe mezintir.

-Axa, tu çetrr ji me dizane, qey gilê karê ciwamêran e?

Weke ku tu şiveke li pozê me teva bide.

Min bersiva wî neda.

ji xwe mêriko her yekê ji me şeqamek li peleguha me jî da. Di nava bêdengiyekê de em li hespê xwe suwar bûn û ketin rê. Heya em ji gund derketin vfoisî qîre qîra mêrik bi ser kurik de dihat. Wistênî nekete yekê ji me. Heya em di neqebka kilometrekê ji gund dûr ne zivîrîne, gund nependî me ne bûye, kitên nekete yekê ji me.

Dîsa me, rastiya xwe neanî ziman û di bîra xwe nexist, me mijar guhert, nus nus û kewt kewta devê deriyê hikûmetê ji bîr kir.

Li gorî rêwingîtiya me, şeva sêyem gereke em li Amedê bane. Ev şeva yekemîn e, şeva duyemîn qonaxa me Siltan Şexmus bû... Ocaxa avzel!.. Qonaxa Dayika Siltan, ku Xezal didohtin. Digotin keriyek Xezal, her sibeh bi berbangê re tê devê derî, dayika Siltan radibe, daw û delingên xwe diçikçikîne, mîna bêrîvana bi tenê, keriyê Xezalan didoşe. Ber êvarî, roj li ber ava ku asoyê cîhanê di nava xewrebezê sorgerê de xemilî, keriyê Xezalan careke din tê mexelê xwe û Dayika Siltan radibe dest bi bêriyê dike. Çawa Dayika Siltan destên xwe diavêje guhanê Xezala pêşî, dengê bilûrê hûrik hûrik dilorîne, heya ku karê xwe tamam dike; dengê bilûrê di nava xwarûpêçkên gelî û mesîlan da li hevûdin tê ba d. n. Kî pif dike bilûrê, li ku hidamê lêdixe kes nizane. Şîrê ku Dayika Siltan didoşe, sibehî ji xwe re dibe mast. Bêyî germkirin û haveyn û meyandina şîr. Şîre ku Dayika Siltan valadike mekaban, sibehî mast e. Çawa vala dike mekaban, teliya qelîçkê di nava şîr dadike û ser dinixumîne.

Mala mêvanan, mala rêwingiyên ji rê ketî. Dayika Siltan diçe xeybê!.. Ku mêvan hebin, dengê xwe li micêwr û koçekên Siltan Şâxmus dike û dikevê odeka xeybê, li ser cilika limêjê rûdine, cilika mîna foteke diavêjê ser serê xwe û diçe. Bi hewara bêçaran, ji rê ketiyan û qeçaxçiyên cendirmên Roma Reş bêhtengiyê li wan dikin. Hew te dît, qîrên pê ket û bang kir: 'Lawo Lawo... Lawo hey ji xwe hebin.' Bû kevokek, bû teyrikekî çilûheft rengî û firriya. Çû li ser çiqliyê darekê danî û di guhên qeçaxçiyên de qulquland. Xwend û beland, lorand, bi zimanê hal- weteke ku bêçaran ji destên zaliman xelas bike. Hew te dît neferên Roma Reş, ava reş bi ser çavên wan de hat û hittim bûn, kor bûn, dora xwe ne dîtin, karwanê qeçaxçiyên di ber wan re bûrî, çûn. Yan jî kerwan şiyar bû, riya xwe guhertin. Çîroka Sarîk di nava xelkê de heya îro jî tê gotin. Sarîk di temenê xwe de du kar kiribûn. Di xortaniya xwe de, dengê daholê ji kuderê hatibane a wir bû û di serê govandê de dîlan dikir, piştî zewacê dest bi rêzantiya qeçaxçiyên kir. Piştî zewacê bi sê salan ji pêpelûka bandê dikeve û ji her du çavan hitim dibe. Bijîşkek namîne ku serî lê nade. Şex û mişayixek namîne ku qista derîstana wî nake. Qurban dan xêr nekir, rojî girt, sê rojên dirêj tewandin, sê meh girtin çare ne dît. Xêr nake. Geyayek namîne, dermanek namîne ku naxwe, sud nade. Dawî tê pîpînga dergehê Siltan Şêxmus û xwe diavêje erdê. Mîna gayê xerab ketî, dibe bor bora wî digirî. Ax, kevir û kuçan li nav ser û guhên xwe dide. Sarîkê di xortaniya xwe de fîtoskî, piştî zewacê rênas û gemasê di nava heft welatan de xewas, bi nav û deng, piştî zewacê bi sê salan, ku bûye bavê sê zarokan neçar e. Barê wî giran e. Nanê deborê di devê şêr de ye, dike û nake, serî li kîjan çarê dide sud nade. Mefera wî namîne xwe diavêje tor û bextê Siltan Şêxmus. Dayika Siltan micêwrê ocaxê dişîne, S rîk ji



erdê ranabe, her dike hawar û qîrên. Serê xwe li dîwarên hewşe, li dar û beran dixê. Dayika Siltan bi xwe diçe, dinêre ku Sarîk serê xwe bi heft cihan şikandiye. Sarîk pêjna dayika Siltan dike û bi zûrêniyeke gurkî dest bi dexaletê dike:

-Dayika Siltan, Dayika Siltan mefera min û zarokên min maye tu. Dayika Siltan min di temenê xwe de mîroweke Xwedê, kêzikek, kurmikek ciz ne kiriye ku ev rebenî û bêzarî bi serê min de hat. Ne tenê ez, zarokên min jî bi min re ketin nava kêferateke bêmecal. Em bûne yê devê deriyan û min mical bi destvekirinê, nanê bi kerdên bê xîretiyê nîne. Nanê bêxîretiyê kurmî ye. Dayika Siltan, ez dexîlê xwedê û ocaxa te me, çarekê. Ji bo navê wî Yezdanê ku ez û tu her du bi can kirine, deriyekî xêrê ji min û kufletê min re bibîne.

Du hêstir, mîna du stêrikan ji çavên Dayma Siltan dikevîne erdê. Di cih de du kulîlkên hêviyê şîn dibin. Di cih de, pê re pê re bel dibin û rengîniyeke têr ronahî didine derdorên. Dayika Siltan dirahêje destên Sarîk dibe hindur.

Li bar kaba wî rûdine û dibêje.

-Kurê min, hêvî wînda nabe, tucaran wînda nabe. Dilê xwe fereh bike, Xwedê derd dane derman pê re. Serê her tiştî bawerî ye, qinyat e. Bawer bike bi kûdîne, qinyata xwe bîne destên xwe bipalîne, bi îmaneke duristî dest bi kar bike, tê bigihe miraza xwe... Tu na terpile.

Dayika Siltan çawa gotina xwe xelas dike, radibe û ber bi odeka xetbê diçe. Kopalek di dest de vedigere.

Car din li ber kaba Sarîk rûdine û dest pê dike:

-Kurê min, ev wê bibe çav ji te re, wê bibe ronahî li ber te, lêbelê roja ku te xiyaret bi dilê xwe re, bi bextê xwe re, li hevalên xwe kir, car din tê serê xwe li dîwaran bide. Emanet û qiyamet, xiyaretê li

bextê xwe neke. Mirovê ku pişta xwe ji te re vekir, pê re durust be. Gotina dayika xwe ji bîr neke Sarîkê min.

Û kopal kire destên Sarîk.

Çawa kopal kete destên Sarîk cîhana wî ronî dibe. Radibe û li dora xwe diçe û te. Derdikevê hewşê û çindirkan dide. Sarîk bi dilcoşiyê mezin vedigere mal û dest bi karê xwe dike. Peşî kes lê ewle nabe, wî tenêya serê xwe barê qaçaxê li pişta xwe şidand û çu hat. Xelkê nêrî ku Sarîk bi tenêya serê xwe, bi wê korîtiya xwe pistiyên qaçaxê ji Serxetê dibe Binxetê, ji Binxetê tîne Serxetê. Qet rojekê mayinek pê de ne teqiya, serê wî û neferekî Roma Reş liqasî hev nebû. Ew xeta sînor ku bost bi bost hatibû mayin kirin, bi têtên dirrihî hatibû sênc kirin, li ber Sarîk, mîna gastmka binya mala wî ye, diçe destava xwe dişikîne û têt. Sevekê diçe, şeva din vedigere. Hêdî hêdî, xelkê mîna berê qista mala wî kir. Sarîkê Kor, careke din weke berê, bi dilsozî dest bi karê xwe kir û bû rêzanê qaçaxçiyar. Kerwanê ku Sarîk rêzantiya wan dikir, yt' carê bi tenê ne terpilîn û duçarî bêbextiyê nebûn û yek carê bi tenê ne ketin kemîna romiyan, ne teşqilîn.

◆ V

Çîrok û çîvanokên li ser\ayika Siltan têne gotin ne yek e, ne didu ne... Bi sedan çîrok û çîvanokên wê hene. Barê titinê kiriye ka hebûbiyan... Birrê karwanê Liciyan di hewşê de kiriye keriyek pez... Femandarê cendirmên Tirkan ku bi suwarî kete hewşa Siltan Şâxmus û kire şii d' n .ildim, çawa ji hewşê derket, hê negihayî ser rîya Amedê ava reş bi ser çavên wî de hat, kor bû. Heya sê caran nehatiye xwe dexîlî kavi lê Siltan Şâxmus ne kiriye, xwe ne spartiyê ocaxê, nebûne dîlzarê ocaxa avzel, ronahiya rojê nedîtiye. Dibêjin ew ft rmandar ji wê rojê û pê de cilê eskerî li xwe ne kirin û her sal

tê û qurbanan li ber dergehê Siltan Şâxmus digurîne. Ne ew bi tenê, lawirên kerrende, lalûebkem, ku birîndar dibin xwe diavêjine tor û bextê derîstanê Siltan Şâxmus, Dayika Siltan wan derman dike, birînên wan dipêçe, heya sax dibin xwedî dike. Ne heddê nêçîrvanan e ku li derdorên Siltan Şâxmus nêçîrê bikin. Ne heddê wan e ku di nava sînorên erda Siltan Şâxmus de bêhna barûdê bêla bikin, davikan vebidin, çîtikê bigerînin, kozikên nêçîrê ava bikin. Gelek nêçîrvan, mîna fermanîdarê Tirk kor bûne. Ketine xefka ku li ber lawiran veda ne. Gelek kesan ji destên Siltan Şâxmus darbe dîtine. Gelek kesan!.. Ocaxa avzel, ku kes jê xelas nabe û na nicinîne. Wargehê bêçare û bêzaran e.

Armanca me, şeva duyemîn ewder bû. Min ti temenê xwe yê ter qerqeqşûn de nirxekî giranbiha daye ocax û kesên xwedî ocax. Berşan, ango gelê me çavdariya tiştê wiha dike. Eger te nirxê ku ew li dorê digihine hev girt, tu dilê wan xweş dike. Vekirî neyinî ziman, di dilê wan de cihekî te, giraniyeke te çêdibe. Ev xislet r sertaciya min bû. Min gelek xerabî jî kirin, min gelek kes aşandin, weke marê pêvedanê, carinan weke mare di tûr de li ber derba xwe veketî bûm, lêbelê di dilê xelkê de cihekî min yê parastinî hebû. Ev bû!.. Ev xisletê ku min nirx dida nirxê wan. Ev çend hinekî parastî- na min bû jî. Mal û kesêa xwedî ocax sertacê civakê bûn, xwedê giravî ez jî yek ji wan kubkubeyê ku civak birêve dibir bûm. Li cihekî nirxê min bû ku min diparast. Bi kevirekî du çûk.

Sala ku Ehmedê Mehmudkê ji Binya Xetê hat û li Dalînê rûnişt, kezebên min û xwarziyê min Mihemedê Hesîna qetiyên. Me got, bi merdiya xwe ji me merdtir e, bi mêraniya xwe teqepaşiyê nadiye û mezinatî ya wî ye, ne ya Mihemed e. Dizanê bi axive, dema diax- ive ji Cegerxwîn û Melayê Lizîrî reşbelean dike rêz û ne mîna bavê xwe

hişk e. Bi sofitî û 'qewlê şerîeta resulellah naçê ser pirs- girêkan.'. Digihê Filihan ola xwe diguhere, dibe Filleh, digihê Êzîdiyan ola xwe diguhere dibe Êzîdî, digihê Misilmanan ola xwe diguhere dibe Misilman. Min ji xwe re digot, riya min û beza min li nava Şemika xelas bû, rê li ber min hate girtin, ne Şemika û ne Rayit pêça xwe hew didê min. Ehmedê Mahmutkê, nahêle ku ez û xwarziyê xwe bi dilaramî li civatekê rûnin. Çengê rastê yê Hesenê Haco ye, bi salan li bajar û welatên biyanî geriya ye, bi wezîr û paşa û maqulan re rabûye rûniştîye, zana ye, Mihemed mecal pê nîne. Ehmed, Salihê Mala Bozo jî daye kêleka xwe, xelas. Eşîra Şemika safî bû. Mihemedê reben ku çar perûtkên Mala Şindî li piştta wî ne, nikarin berberiya Ehmed û Mihemed Salih bikin. Hah me dît hunerê Ehmed derketin meydanê. Ehmed bi rexneyekê hate ser civakê ku ne nirxê wan hişt, ne bawerî û dilpenahiya wan hişt. Devjenkêya wî bû dengênî. Olparêziya Misilmanan, şax û mişayix rexne kirin. Pêşî ji gundiyan xwe dest pê kir û yariyan xwe bi sofiyan gund kir. Demekê sofiyan Dalînê dijwar bûn û Xwedê ji erşê heftan anîbûn li gastînkî mizgefta gundê Dalînê danîbûn û bombe û topên xwedê ji serê mitik û neqebkên gund bi ser rebenê Hevêrînê, Nibilê de direşandin. Kesî nikarîbû ji sofiyan Dalînê cilêt û cûzan bidê ruwê xwe. Ehmed piştî dijwariya wan bi çend salan hate gund û çîrok û çîvanokên wan ku qemûşk girtibûn bi neperûşkan xepartin, bi xwîn kirin. Rabûn rûniştina wan rexne kir. Di rojîya Remezanê de cixare vexwar û got mele nizanin, derewan dikin, cixare rojiyê xera nake. Roja îne ne çû mizgeftê, di nava gundiyan de rûnenişt. Sofiyan Dalînê teva kirin dijmin ji xwe re. Min di dilê xwe de got: 'Ehmed bûye paie Mihemedc Hesîna û rêza wî, benda wî xurt dike, çiqliyê bin xwe dibire.' Piştî min bakire Mihemedê Hesîna û gotiyê:

'Hinekî sebir bike xwarzê. Ehmed bûye pale û ava te zêde dike.' Mihemed mirovekî köhne bû, têgihişt û dengê xwe nekir, sebir kir. Lêbelê xisleteke Ehmedê Dalînî hebû ku min gelekî jê dipelikand. Xort li dora xwe didane hev. Bûbû pîrê xortan. Xisleta wî ya rêxistinî hebû, kesî dora xwe kom dikirim Vekirî digot, xort li pişta min bin, pîr û kal çi dikin kêfa wan e. Pîr û kal yê gorê ne, xort yê jiyanê ne. Xort besî min in. Çavê min ditir- siya. Xort barê giran digirine ser milên xwe. Xwîna wan dikele, germ in, teqepa^iyê nadi lê T e. clê ew taybetiya ku bi neperûşkan dida hev, yan jî bi kevgîrê dida hev û bi bêrê û melhêbê bela dikir, dilê min xweş dikir, ku nabê astengeke mezin li pêşiya min. Weke van kelem û dirrihên din. Ha yek kê, ha yek zêde cudatî çênabe.

Lewra ez dêhnê xwe didime we ku hun ev nifşê han teva xort in û di nava civakê de bi dijwarî diçine ser pirsgirêkê. Mebesta min ji van tiştên ku dibêjim ew e ku hun hinekî civakê nas bikin, me nas bikin û dizanibin çi dikin. Lêbelê taybetiya we ne weke vanê berê ye. Pirtûkên we hene. Defter û qelemên we hene. Emanet û qiyamet ku we civînên xwe li Mala xêro dêro çêkirin, xwe hewqasî ne şemirînin, hewqasî li xwe ne ewle bin, hun dewleta Tirk nas nakin, dengê xwe nake, lêbelê ku dengê xwe kir, afatiyê bi derdoran de tîne. Alfaba qirkirinê ya wan e. Tu jî dizane... Hey ji xwe û kirinên xwe hebin. Ne mîna Ehemedê Dalînî bi devjenkê êrîş bikine hawîrdorên xwe û ne mîna min û ne mîna Mihemedê Hesîna xwe bi dev çarenûsiyê ve

berbidin. Bi zanahî bi tiqûlînin û mina kewê ribat bizanibin cih bigirin, da hun jî mina nifşê me çîz nebin. Li me jî ewle nebin.

Dêhnê xwe bide nifşê me teva şikestî ne. Mêrê şikestî çarenûsî ye. Çima Mihemedê Hesîna nikarîbû Ehmedê Mehmudkê tu dizanî?

Mihemed sêwî rabûbû û heya roja mir jî bi navê dayika xwe dihate bang kirin. Ez vê çendê xweş dizanim, ez jiya me... Parçeyek dilê wî di bin lingan de diperçiqî. Pismamê wî di gund de yên herî dewlemend bûn û teva li yek desti li pişta wî bûn. Xwedê heye ew jî bikêrî karê cîhanê dihat û di nava civakê de cihekî xwe çêkiribû, lê, şikestî bû. Ji ber ku kurê jinebîkê bû û bi navê dayika xwe dihate gazî kirin. Heya roja dawî mîna toqê dilwêranî distuwê wî de ma û nikarîbû ji ser xwe biavêje. Ehmed bi degeliyeke neqam çj'~û ser, li her dever, li her cih û warî digot ku Mihemed mirovekî jêhatî û başbane bi navê dayika xwe nedihate gazî kirin. Civaka me Kurdan xwedî hinek taybetî ye. Civaka me jî ne gihaye ku dikaribe hinek xisletên perçiqandin, yan jî pesinandinan ji ser xwe biavêje. Civakeke şikestî ye. Mirov jî, ax jî, av jî, dar jî, lawîr jî şikestî ne. Dêhnê xwe bide se û kûçikên nava gund, dema romî têne gund dikevîne qui û qewêran û ârîş nakine wan. Lêbelê ew se û kûçikên gundiyan ku mirovên gundî, di ber WM re diçin û tîn, çawa har in, çawa ârîş dikine ser xelkê, çawa dirrinde ne... Ku romî tîn, kûzên ji wan tê û dikevîne bin taqê tenûr û dîwaran, xwe vedişârin. Ku romî li gund hene dîkê gundê me jî bang nakin. Meleyê gund bi xwe jî bi tirs derdikeve ser banê mizgeftê û bi dengê melûl bang dike. Eger te jê pirsî wê bêje, dengê min ketiye, qiriqa min diâşe, eda xwa xera nake, lê rastî jî nabêje, tirsaxwe nadê der. Suryaniyên me wê rojê li naqosê naxin. Tenê Lahdoyê Dîn, tenê ew tirtên û pivtênê ji kefa mista xwe tîne. Wekî din gundî ji koç û mal teva di nava tirsekê de dimelisin. Teva du romî li gund in. Jinên xwedî dergûş, zarokên xwe bi romiyan ditirsînin. Zaroka ku hê ji dergûşê bi tirsaxwe romiyan mezin bû, wê çawa li ber romiyan dest hilîne û dikaribe serê xwe rake. Romî dibe pîrozgeheke ku nikaribe destê xwe bidiyê. Tenê dikare

biçe tewaf bike. Tewafa ocaxa pîroz... Romî dikevê nava parastineke berz û pîroz.

Ku tu bixwazê civakê nas bike, dêhnê xwe bide kûçikê wan.

## QESEM NAVÊ XWEDÊ YE

Qesem navê xwedê ye ku ez neweyiyan nekim. Roja sêyem em gihane Amedê.

Xeftanê Birca Sêxuşkên heftxemleyî qeremsiltanê melezi ye.

Bîstana dilê Birca Heft Birakan şîna demsalên helezî ye.

Misk û ambera di nava kezî û biskên Sêxuşkan de bi ser pêl û şelqên Ava Mezin de pêl dibû. Her cara ku furêna bêhna bixûra dilê Sêxuşkan dihat, qamçiyê dilê Heft Birakan lê dida û birûskên çar bask û çar çiqî di ser asûmanên Amedê re xal vedidan. Ezmanekî çîksayî di nava brûskên agirê dilê Heft Birakan de dilerizî. Tevzînokan digirte rewa erdê. Erd ji qatmanê Kûra Zerzemîn dihejiya. Xummên bi erdê diket. Ava Mezin dikeliya, hêrs dibû, dirabû, dilind dibû, rimmên û gurmêna avê cîhan dadigirt û bi yek carê mîna şixra ku werîsê wê biqetin ji nişkâ de bi ser hevûdin de bi xuşşeniyeke berz semeqot dadiket.

Hêdî hêdî seqema Amedê li dev û ruwê me dida.

Li Tora Hevêriya Bihara gulbijêrkan dest pê kiribû.

Amedê, hîna seqema Zivistanî ji ser xwe ne avêtibû.

Çiqasî em nêzîkî Amedê dibûn, dilê me yê zîz bêhtirîn dikire kutekut.

Bi her gava ku em ber bi Amedê diçûn re, dilê me kopalekî şiddihtir û diwartir lê dida. Li hemberî Pira Deh Deri, riya dilê min di sebeta sînga min de nema. Dilê min mezin bû, di nava parsûwê

min de werimî. Coşekâ û heyecanekê ez girtim ku min li ser hespê hew debor kir. Min serê hespê ragirt û peya bum.

Em hemberî kevnariya dîrokê ku li ser beden û keliha navdar pelax bûye, bêhnikeke baş rûniştin.

Roj li ber ava bû û bayê seqemî hêdî hêdî xwe li hinavên me dipêça. Kincên me ne hewqasî Havînî bûn, lê, ne zivistanîbûn jî.

Min xweş dizanîbû ku kurka me li wir, li ser hêkên zêrîn melisiye. Du gavî din ezê bigihimê û ji bin kurkê rahêjim hêkên zêrîn. Wilo hêdîka. Heya niha min gelekî kerd kirine stuwê dewletê. Kerd ji vê mezintir... Min herêmek safî kiribû, serîhildanek têk biribû. Serekçetê dewletê bûm. Paşa û fermanदारên dewletê ji min re pête didan. Dema şer hebû ew nixê mezin, ew payeberziya mezin bi min didan... Ku niha pariyekî bi tenê bi min bidin bes e. Xwedê dizane ku Roma Reş heya îro daxwazên min anîne cih. Min çî gotiye kirine. Mirovê ku min destê xwe pê ve kiriye, ne nicinandiye û ji hêbet û hişima dewletê xelas nebûye. Hemberî dijminê min ez diparastim û ne dihiştin ku pirtik bi dijminê min bên.

Dijminê min, dijminê dewletê bûn.

Dewlet ez bûm...



cara du çar, teva xayîn bûn.

îdê, her sê qesem navê xwedê ne, ku ne ji dewletê be, rojek d ez xwe li ber hemberê xwe nagirim. Wê min di kevçiyek 3e bixeniqînin, kes nizanê ne ez hebûm, ne ez nebûm. Xwedê îwletê ji serê me kême neke... Xwedê mezin e û piştî dewlet!.. Bere kes wesfê xwe nedê ji dewletê pê de... Bere kes!... Ne bêjê ez mezin im, ez paşa me, ez mîr im, ez serkâş im, ez axa me... Cihê ku dewlet lê be ew e mezin,



ew e ocax... Çi marê pêvedanê ye... Dewlet ku mirov raçavî xwe kir, ya azinellah, atlayîyê nade û fer-ezendê nas nake, düpenahî li cem nîne, bi guzêka mirov ve dide. Di cih de, di cih de dihêle. Av nagihê ser. Ji xwe weke tiştê nebûye, car din tê devê deriyê te, li ser cila te rûdine, nanê te dixwe, ava te vedixwe, bi te re diaxive. Ku te dengê xwe derxist mîna kewê miqapç hemberî de zîq radiweste û li nav ser û guhên te dixwe. Bavo, dewlet gelekî mezin e. Dewlet dibin xwedê re, xwedê ye! Dewlet dewlet e!..

Mistefa Kemal Paşa ji bavê min re beratname şandibû. îmza wî li bin gotin û galgalên pîrozbahî hebû.

‘Ezîz Çelebî Axa Hazretleri!

Ez kurê wî ezîzî bûm, ku bi fermana xwe ew kiribû zîndan û kir ku sipihan çavên wî xwarin. Çawa nizanê û min nas nake. Femandar û paşayên ku pête ji min re didan, çend caran silavên wî, silavên İsmet Paşa ji min re anîn. Gele İsmetê kerr pê re ye. Ne gir- ing e, pê re ne pê re, ezê patekê jê re bidim û nasnameya xwe bixwînim. Mîna femandarekî serfiraz. Hingî wê min nas bike. Hingî ezê bême bîra wî. Kerdên min ku di stuwê dewletê hene, wê bêne bîra wî. Yek bi yek... Min quloçê beran û berxên salê jê re bir- rek kiribûn. Min serê gelek beran an jê re ser jêkiribû, jê re kiribûne qurban û dehî, jê re kiribûne heqîqe û xêr. Min cîhanek jê re kafûkûn kiribû, çawa min nas nake. Çawa!..

Qet ne dihate bîra min ku wî beran diberdane hevûdin.

Qet min bîr nedibir. Qet!.. Ku beranan pevçûn ne kiribane jî, dirahişte stuwê beranan, dirahişte quloçê beranan û dianîne hem-berî hevûdin, quloçê wan bi hevûdin difirkandin û dev ji wan berdi- da. Pevçûna beranan zexim û bi kotek e. Mîna ciwanîkên

şemûs û di yek saliya xwe de radibûne ser lingên paş û xwe didarine hevûdin. Pelqêna quloçên wan bombe û mayinên canbêzarî ne. Girrê beranan pîs e. Ku beranan girrê xwe di hevûdin dan pê de, heya yek yê din bibezîne li hevûdin dixin. Quloçê wan bişikihin, bi xwîn bibin xemgîniyê na kişinin. Heya yek yê din bibezîne, bela xwe venakin. Min nizanîbû. Heya ku awira xwe di awira min de şikand û guwê devê xwe zeri devê min, hingî pelqênî ji kevçika dilê min hat û derzeke bê cebar di serdilkê min de rûnand, ji nû hişê min hate serê min. Gu bi bave xwe re xwaribû, heya ku gu ji ser zimanê wî peki li dev û lêvên min ket.

Ji bo min sê şerê xedar hene. Yek jê şerê ku beran hemberî hevûdin dikin, yê duyemîn şere ku dûbişk hemberî hevûdin dikin. Yê sêyemîn birazî, ku ji bo min yê herî dijwar e, şere navbera pis-maman, şere navbera hemwelatyan e.

Dûbişk û mar dijminê hevûdin û cîhan teva dijminê her du basikan e. Em Kurd in... Em dijminê hev in, cîhan teva dijminê me ye.

Wilo xuya dike ku te ne dîtiye. Tu jiyane nas nake. Nifşê te ji jiyana kerkulî dîr e. Te jiyana rawan dîtiye. Jiyana bezê, ku mîna mirowên bê encam dixerbin, ji vê dikanê dikevîne wê dikanê, ji vê kolanê dibezîne kolana din, ji vê qehwexanê dibezîne ya din. Di navbera avahiyên l/s^ hevûdin bûne rêz û têr ronahî de, bê xwe- hdan tev dikevin û tev radibin. Lê, jiyana gundan jiyaneke kerkulî ye birazî. Ha cot e, halet e, nîr e, kûlabe ne, mişane ye, bose ye, pez e, dewar e, kesax e, aşêf e, liqat e, paleyiye, gère ye, dêran e, av e, çal e, hewş e, derî ye, sênc e, şivan e, gavan e, ziving e, girîş e, cêzî ye, tirih e, dewşîrme ye, mewîj in, tenûr e, kûwar e... Baz e, lez e... Bavê te, ha ha dibeze, hedanî na kevê canê wî ku te bidê xwendin. Li vir dikeve, li dera din dikeve ku mesrefa xwendina te derbixe. Di nava jiyaneke

kerkulî de dikeve û radibe. Tu di nava jiyaneke rawan ku mîna ava li herik cihê xwe çêkiriye û bêyî pîşbirk û pîrs- girêk diherike. Lê jiyana kerkulî, dijî xweza şer e. Ji kevir nan derx- istin e.

Erêêê birazî!.. E w lawirê ku çekê wî tenê di serçîçeqa dûvê wî de ye û her dem dûvê xwe li nava milên xwe dike, dema çêlîkan tîne xwe feda dike, mak, xwe ji çêlîkên xwe re dike xwarin. Jiyanêke bi mînak û canfedayî nîşan dide. Lê, ku ey canfeda dikevîne zîqa hev û ji hevûdin d'inirin, ya azinellah çi bi serê hevûdin dikin. Di nava xîşkeke gurover de li dora canê hevûdin, bi gez û gevzekê diçin û tîne. Bi çek û her du kûlabên çengên pêş li nav ser û guhên hev didin. Teq û reqêna wan, qîrên û wîzêna wan erşê heftan diwelîne. Bi derfehatiyeke neqam xwe di nav ser û guhên hevûdin werdikin. Brûsk, brûsk ji cihê darbeyên wan diçe. Radibine ser her du hngên paş û ji dehm de, mîna beranan xwe çend dikine nav ser û guhên hev. Ew canlidarên bê zar û ziman xwe ji ber hevûdin nadine alîkî. Ji ber lawirên cîhanê teva direvin, xwe vediçêrin û xwe diparêze, tenê hemberî hevûdin zalim û derfehatiye. Ew lawîrê ji bo çêlîkên xwe canfeda, ku dikevîne zîqa hev, heya hevûdin çênekin, piştî hevûdin li erdê nedin, qîma xwe nayînin. Piştî ku hevûdin çêkirin, tiştêkî seyr û kes nedî ye, mîna tu lingê xwe li termê dijminê bavê xwe bide, hevûdin zerkî wê gastîne dikin û ku bibe xwarina ber kêzik û kurmikan.

Dûbişk û mar ji xwe... Cîhan teva berz û dijberiya wan, pevçûn û gîrê ku di hev didin dizane.

Xwîna germ û mirin sar navê her sê cureyan e.

Icar min quloçê gelek beranan, bi dijwarî şikandibû. Ê pozê gelek beranan firmandibû. Pismam jî di nav de...

Birazîkê mii^ delai, ku jiyana di nava bergên pirtûk û defteran de, cîhan li ser nexşeyên rengîn nas kiriye, qenc û xweş dêhnê xwe bide min Ber êvarî bû, di asoyê dilê min de tiştek hebû, di asoyê erd û ezman de xîşkeke zerik dirêjî her du milan bûbû xuya dikir. Asoyê dilê min neynika jiyana min bû, asoya xwezayî rastiya min bû. Kewekî derengmayî di ser diyarê raserî Pira Deh Derî re diqub-quband. Di nava milkuliyeke bê wate de dengê xwe hûrik hûrik derdixist. Heh me dît yekî din ji nizarê wiyalî, hemberî kevana wî qelaçî bersiv da. Dengê her du Kewan hat û hat li hemberî Bircika Sêxuijkan xwe li hevûdin pêça û mîna bayê li ser berg û kaxezên sayî, têhnika qalemê lêneketî bilorîne, wilo bi dengê şikestî û hawarî li ser şelîta distuwê Şâx Seîd, Seyîd Riza de û Bavê Tûjo de bi rengê tîr çirisandî xal veda. Hingî Sadun Beg hate bîra min. Lê min di cih de ji bîra xwe mîna tîfekê avêt. Nawîskên xalvedanê fereh bûn, hatin li rûdêna Ava Mezin, di nava kûraya dilê axê de, bi rewa û têhnikdana veketinê şilokeyî bû, verivî, hate guvaştin û ji nişkê de teqiya, tirheke ziravik, di rengê zerahiya bi rengê rojê xemilandî da der. Kata jiyane!.. Di nava asoyê xeta zêrîn de bilind bû. Kewan qeqeq û çîrrêna xwe ranewestandin. Ew kevîrên reş ku ji heft aliyên Kurdistanê û Mezopotamya li ser piştê Hêstir û Kerên pişt kurmî hatibûn berhev kirin û bi xwîna nîfşê komên xelkê li ser hev bûbûne rêz, mîna li dîlok û leylandî Sêxu^kan guhdarî bikin, dilwêran dibûn. Bi nalênî û heydêniya dilekî sar li mikubandin û qirûçiya dengê Kewan guhdarî dikirin. Dilê min dixwest ku bi Kewan re bixwîne, bike qeqeqibandin. Dilê min Kewekî li ser darikan bû û ha ha bi coşiyê neqam lê dida. Dixwest ku tevî xurra Kewên bi rojava re hemberî Bîrca Sexuşkan diqeqeqibînin i û hestirê

Ava Mezin di herikî, qeçeba Kewan diherikî, kevnariya dîrokê û serdilkê kevirên reş yên bedena Amedê diherikî û horhora kelekvanîyan diherikî. Kelekvanî hemberî wê sermayê cot bi cot, di yek şîbaqê de ber bi Pira Deh Derî diherikîn û wey li wî ku berî yê din di deriyên pirê re derbas bibe û desfnala xwe ber bi ba bike.

Ava Mezin diherikî û xwîn diherikî.

Herka Ava Mezin zêde û fereh dibû, herka xwînê zêde û fereh dibû. Serdilkê kevirên reş ku di nava kevnariya dîrokê de nepixîne û hew dikarin bikin kazên û dengê xwe derbixin, li gorî herka avê, li gorî herka xwînê dirabûn û rûdiniştin... Daw û delingên xeftanê heft rengî û ji rengê xemla heft bajarên Kurdistanê hatibûne dirutin, li bejnûbala Sêxuçkan, di nava eda karxezalî de ber bi ba dibû û diherikî. Heft Birakên bi şûr û mertal û ahenpûşî de pêçayî hemberî herka avê, herka xwînê rawestiya bûn, şerê dîrokê dikirin, Sêxuçkan dilîliyand, Heft Birakan cenga xwe dikir. Geh suwarî, geh peyatî. Şûre di destê wan de dişikestî, mertalê di destên wan de diqe.îştin, gurzê di destên wan de parçe dibûn. Lêbelê yekî ji wan çogên xwe bemedane erdê û hemberî dijmin serê xwe ne kubandin. Çîz ne bûn.

Bi sedan sal e ku çîz nebûne.

Ciwanîka min ku hewqasî li ser dilê min pelo bû û pîkol kir. Her du lingên xwe yên pêş li erdê dan, bi lingê rastê ku mîna bazinekî xetbelekî bû, erd kola. Em ji rê derketibûn û di navbera rê û Ava Mezin de, gastînceke rastik û têr zurik rawestiyabûn. Sar bû, lê tilmanekî em ji ba di parastin. Min hefsarê ciwaniya xwe kişand û jê re tewirand xêr nekir. Ha ha pîkol kir. Kevirekî reş î gurover ji me û wêde bû. Hew min dît ku serê marekî di piştta kevir re ber bi jor hate hildan û zîq hemberî ciwanîka min rabû ser tirriya xwe, rawestiya.

Marekî reş, çav zer û serkedûn... Çavên wî zer bûn û seranserî serê wî yê kedûnî dirêjik bûn. Çîrîskên bruski ji çavên wî divedan. Ya rastî min hêbet girt û dilê min sar bû. Ciwanîka li ser dilê min şêrîn her pîkolê dike, hire hîrê dike û qune qunî dibe. Mar çawa rabû ser duvê xwe wilo rawestiya û geh serê xwe bi çepê de dikubîne û li me dinêre, geh bi rastê de dikubîje, li bejn û bala me dinêre. Rastî ez jî bi ciwanîka xwe re qune qunî bûm. Xwedê wekîlê min û te be birazî, piştî çend metroy- an ku ez û cîwanîka li ber dilê min şêrîn qune qunî bûn, ew mar mîna ku yariyên xwe bi me bike, keniya û xwe paş de vekişand. Çawa lêvên wî ji ser hevûdin çûn, xal ji diranên wî çûn û brûskeke li hev badayî dirêjî serê kevirê reş bû. Agir ji kevir çû. Bê çawa serê

xwe ji piştî kevir rakir û hêdî hêdî hewa ket, wilo ber bi jêr daket û berî ku serê wî di piştî kevir de nediyar bibe, careke din kuffên û fişşan pê ket, zimanê xwe yê zulfiqarî direj kir kevirê reş alîst û devê wî ji hev çû, keniya. Bi metroziyeke henek pê kirinî têr yarî keniya û ji ber çavên me wînda bû. Telafiz li yekî ji me neket û di nava bêdengiyê de li hespên xwe suwar bûn û Amedê meşyan. Me dibin awirên şermok û şikestî de li he\ dinêrî, kuffên û fişên li me diket û he w. Hey a em gihane Mêrdînê yek benîadem ji me neaxivî.

v O

Çawa em ketin hinduruwê bedenê min mar ji bîr kir, mirîşka hêkên zêrîn ketin dilê min. Min hesabê xwe û rahiştina hêka zêrîn kir. Gereke dizanibe û nixê min baş nas bike. Mirovê mezin zana ye, bîra cîhanê dibe, li paş û pîş dinêre, cihê gava xwe ku biavêje dihêle. Dostên xwe ji bîr nake. Nixê kerd û qencyê nas dike. Mirovekî mina Mistefa Kemal Paşa çav. a min ji bîr dike. Ne min bi

tenê, bavé min jî, ji wî ve diyar e. Bavé min ku ji bav û kalên wî re kiriye, ji wî re kiriye. Çiqasî bi destên wî hatibe girtin û kuştin jî.

Ez kurê 'Ezîz Çelebî Axa Hazretleri me.

Bi dilcoşî û kâfxweşiyekê me da devê dergehê Mêrdînê û di nava beden û keliha ku di nava xeftanê perçiqandinê de hatiye pêçan, ketin nava bajarê Amedê. Esra teng bû, rojê daw û delingên xwe li hev didane hev û ber bi ava diçû. Siha bêrêvarkî xwe li mal û sikakên bajarê Amedê dipêça. Tîrêjên di nava xemla rengan de pêçayî li ser rûdêna kevirên ku bi sedsalana çavdariya dîrokê dikin pêlax dibûn. Ji dil û mirazan ew kevir di nava ramûsanên evîndarî de dimiştin.

Bêhna kevnariya bajêr li dev û rûwê me da.

Rengê alên sor. Paçik û terîşkân daleqandî em pêçan.

Min xweş bi Tirkî jî nizanîbû. Bi rê de li mal weke zaroka ku nû diçê dibîstanê, dersa xwe jiber dikir. Bi rê de jî, min di dilê xwe de dersa xwe jiber dikir. Çawa ez ketim hinduruwê bajarê Amedê carake din min dersa xwe ji ezber xwend. Lêvên min diçûn û dihatin, ji hevalên min weye ku ez 'ayatê kursî dixwînim. Wan ji ku dizanî ku ez dersa xwe ezber dikim. Ez ketibûme tayê de ku hemberî destûbirakê bavê xwe, devê min li hevûdin biherbile, şermezar bibim. Ez beranê dewletê bûm û hemberî gelek ber; rabûbûm û min gelek beran çîz kiribûn. Rewşeke wiha, ji bo mm m baş bû. Divabû ez dersa xwe xweş ezber bikim. Degel bim ku şaşiyar nekim, devê min li hevûdûn ne herbile. Ne ew bi tenê, hevalên bi min re wî li vegeerê bêjin. Devê xelkê ne doxîna min e... Ziman felîte û zikreşiya cîhanê, bexîliya benîademên ser reş, wê bi wan bide gotin. Nexasim ku Mistefa Kemal Paşa destên xwe li piştê min bide û eferîne bidê min, min li ser sifra xwe runînê, di cih de wê bêjin. Avê li min venaxun. Nabêjin em pê re çûn û bi saya xwedê û wî bi Mistefa Kemal Paşa re şerefyab

bûn. Nabêjin. Bavé xwe nayînin bîra xwe û nabêjin. Tenê ya xwe bînin ziman. Wan nas dikim bê çi teba ne. Evdê ser reş şîre xaf mihtiye.

Lewra divê ku ez dersa xwe baş ezber bikim.

Piştî ku ez di oda xwe de tenê mam, li xanê, ezê li neynikê binêrim û xwe baş fêrî patê jî bikim. Mîna wan fermanarên têr nîşan ku digihane cem hevûdin, teliyên destên xwe ziç dikirin û bi hevûdin ve dizeliqandin, bi zac û hêrs ber bi serê xwe hildidan. Movika teliya mezin ber bi guhê wan bel dibû û serê teliyên zic û bi ser hevûdin de kutayî li quloçê aniya xwe rûdinandin û bi dengekî bilind kunya xwe dixwendin.

Divê ku ez jî weke wan bikim. Ku dizanibê ez beranekî hewrî me û layîqî hêkên zêrîn im. Min li kêleka xwe rûnînê û di nava axalar û paşaleren dîwana xwe de wesif û pesinê min bide. Hingî ev garuteyên li duv min nikarin zimanê xwe dirêj bikin. Nikarin tişteki ji xwe zêdetir bêjin. Bilî pesindanên min û nîrxê ku dostê bavê min dayî min. Di cih de wê li derdoran bela bibe, wê biçê guhên walî, cjeymeqam û midilumum. Wê biçê guhên wan xwedî gergunkên Estilî. Teva wê li ber min bikevine rêzê. Hingî ez dizanim bê ezê çi ji serê kesên mîna Qasimê Mistefê bikim. Qasimê Mistefê ji roja ku rabûye av bi hestiyên min vexwariye. Bela xwe venakê. Mirovekî belakir e û ji min naxwe. Li gund ne bes e, li hikûmetê jî dikevê zîqa min û berberiya min dike. Eger ez vegeyriyam, ezê jL#bu re dizanibim. Ezê bikim ku sipih çavên wî di zîndanên de bixun. Çend mirovên din jî hene. Çend ne tepteyên din ku weke bizina nojek bela xwe li vî û yê din didin hene. Hesên Mala Xeya jî yek ji wan e. Xwedê ji dayika wan stand. Xelasiya wan ji destên min nîne. Baş e... Xwedê ji min û wan re mezin e. Eger weke dilê min çêbû û hêka



zêrîn kete destên min. Ne axatî û paşatî bitenê... Tekyana cîhanê, mal û mewdanê cîhanê... Mîna paşazadeyên ku balafiran dikirin, dikin xelat û didine dewletê, ezê hewqasî û ji hewqasî bêhtir dewlemend bibim. Çiqasî Tora Hevêriya, bi sewm-û selat, bi zikir-û zekat di destên min de be, ne bes e, ne bes e, ne bes e!.. Ne bes e!.. Dem Destên min bigihê mirîşka hêk zêrîn û nikilan nedê, bes e.

Qamçî di destên min de, şûr jî destên min bikeve xelas, ezê bavê gelek kesan bişewitînim. Ev bêbavê Siloyê Yoqin ku qaçaxiya cîhanê dike, rojekê bavê xwe nayîne bîra xwe û min nabîne. Ezê bavê wî, di gorê de şanî çavên wî bidim. Koçerek nikarê bêyî min li qelaçekî ji wan pezê xwe biçêrîne, celebên pezê xwe bîne arasê bifiroşoerê kerî û celebek pez... Mal qirêja destên mêra ye. U destên min ku hêka zêrîn bidestxistiye.

Erê Birazî...

Bedena Amedê ji derve ve tişteki diqîriya, ji hindurû ve tişteki bang dikir. Çawa em di dergehê Mêrdînê re ketin nava sînorê bedena bi kevir û kûçên reş î zemanî hatiye pêçan, em liqasî cîhanê di nava rengan de xemilî bûn. Bajar seranser bi al û desmalk û paçik û ta û benik û şelften rengo rengo xemilandî bûn. Alên sift sor û terîşan rengo rengo di ber re dirêj kirî, bi serê stûn, kijulek û mişanên ji ber haletên cot mayî ve kiribûn û li ser bircik û taqên bedena reş girê- dayî ve çikandibûn. Devê dikanan, devê pace û deriyên malan teva bi sor û xemrî û kesk rengîn kiribûn. Tu ji xwedê bawer bike birazî bi stuwê keran ve jî, ew terîşk û paçik û cilikên rengîn daleqandibûn. Amedî ne hînik in, ji qest û dexûsî desmalkên sor û terîşkûn spî bi stuwê kerr û hêstirên xwe ve daleqandibûn. Ango, ew jî serdana Mistefa Kemal Paşa ya Amedê pîroz dikin. Kurrroo li vê kesnediyê, al û stuwê ker û hêstiran? Tu dizanê ku

pişta berxik, kavir û beranên dermalan reng dikin. Ji bo ku kifş bin, çî reng li mal hebe li pişta wan didin. Ku mirov di dergehê Mêrdînê re dikevê hewşa bedenê, ne bi tuwî, li milê çepê gastîneke fereh derdikevê hemberî mirov. Mîna Arasa Midyadê, kes û kûs sewalên xwe tînin û li wê gastîna fereh difiroşin. Arase ye... Roj li ber ava bû û bazar xelas bûbû, lê, keriyên meh û pez û dewar hebûn. Hêdî hêdî xwe didane hev û sewalên xwe didane ber xwe. Ew sewalên firotinê kişûmat di nava rengan de xemilandî bûn. Heya f>u stuwê çêlek û stirihê ga û beranan bi terîşkên sor û sipî xemilandî bûn. Icar kerê wan celeb- vanan... Ew sewalfiroçên ku stuwên kerên xwe jî rengîn kiribûn, xwedê dizanê çiqasî ber xwe diketin.

Axir, em gihane devê dergehê Xana Hesên Paşa.

Aleke rizî ji hevûdin de perpitî û bedidî, cih ciha ku cihê diranê mişkan tê de xuya dikir, kelpitî, di nava toz û remedîlka salan de qemer bûyî, rengê sor çûbû renekî din ku di nava rengan de nîne derketibû meydanê, bi stûnekê ji ya hewşa xanê ve daleqandî bû. Ji xwe spîtiya ] syva li ser paçikê reng gelcoyî hew xuya dikir. Tenê anîşkeke stêrikê, mîna diranek tenê di şikefta devê mirov de bimîne û dema kenî ew diran ne firçekirî û zingarî be, hemankekê xuya bike... Em ketin hewşa xana zemanî ku em çî binêrin, li pîpîngê teji mirov bû, rê nebû. Me di nava westandina rêwingîtiya sê rojan de li hev nêrî, lê em dikarin çî bikin. Me dizanîbû, yan jî me bawer dikir ku ev tevger, xemla Mistefa Kemal Paşa ye.

Kemal e Kemal e

Kemal bave me ye

Me wilo dizanîbû ku Amed tenê bi pêxwas û kevne pêxwasên ku dibêjin 'ix birê min ix' navdar e. Ku pêxwasên Amedê, belakirên Amedê pîr û kal dibin, dibine 'z'x'vanê xortan. Mina kalemêr û

şêwirmendên pejirandinê, zirtek û pêlewanên li dîwana padişah û mîrekan her gotina tacîdaran bi pejirînin, ku pêxwas û belakiran serpêhatiyên xwe gotin, ‘min xiştika xwe kişand û li bin cengê filankes û bêhvankes da, di serê ‘xiştika’ min de, parçeyek dil, parçeyek kezeb û gurçik, rovî û xwîna pingihayî ma’, pîrê kal pêwiste ku bêjê ‘ix birê min ix’. Ew pêxwas û belakirên Amedê ku piştî pêlavên serî ziravik dişikînîn û çengên di zendikên cakêtê xwe re nakişînin, sînga wan heya bi navikê vekiriye û her û her bi tilekî dimeşin, ku pir dibûn, dibine qeşmerê xortan. ‘Ix’ a wan pere tîne. Ji xwe kar nine, ew pejirandin dibe debora wan.

Yan, pêxwas û belakirên ku sê sê, çar çar didine duv mirovekî biyanî û li dora wî û teşqela diğerin, ku mirov diçe Bazara Masiyan, bi dehan pêxwas û belakir li wir in, ku tu diçê Çarçiya Şewitî, hakeza, ku tu diçê Melik Ehmed sê-çar belakir li wir in û li devê dergehê çiyê, li hidama dergehê Rehayê bi dehan pêxwas û belakir li ser qundirê şerik tûj û pişt şikandî, bi awireke tûj li nêçîrê diğerin. Ew Ameda ku di dilê xelkê de birînên xiştikên pêxwas û belakiran vekiriye, îro di nava xemleke heft rengî de, di nava xemla Mistefa Kemal Paşa de rengîn bûbû.

Bi wê temtêlê me xwe gihande devê Xana Hesên Paşa. Xana Hesên Paşa li meydana Kayê bû, nêzîkî Melîk Ehmed û Çarçiya Şewitî û Qesabxanê. Saraya walî, jê ne dûr bû. Em westiya bûn, dewarên me westiya bûn. Ew sê roj bûn ku em bi rê de dimeşyan. Xwediyê xanê ber bi me beziya, rahişte hevsarê hespên me û bi nirx û birêzî em bifermoyî salonê kirin. Xwarin li qirika keran bû. Em, bi hêka zêrîn û dîwana Mistefa Kemal Paşa germ bûn, axalerên bi min re jî comerdî dikirin. Ez serkêyê wan bûm û bi saya min dihatin

dîwana Mistefa Kemal Paşa. Xwediyê xanê xwarin li ber me rêz kir. Bi kûbarî û maqultiyeke mezin em li ser xwarinê runiştin. Rêwingiyên di salona xanê de rûniştî teva li me dinêrîn. Duwazdeh girgirekên pîpikandî, simbêl qeytanî û şedûbeda suwarî bikevine hewşa xanê, bêguman bala xelkê dikişine.

Marê qeraxê Ava Mezin ne bes bû, marekî din da devê den, hat û hat li kêleka min rûnişt.

Em di ser xwarinê de bûn, hajê me ji bayê felekê nîne, mirovekî terz bajarî, pîpikandî, gergefka wî di stuwê wî de da devê derî û li salona fereh nêrî. Ew mirov çawa kete hinduru, nîvê salonê ji ber rabû û silaveke birêzî danê. Ji me weye ku mirovekî dewletê ye û li wir dimîne. Bi awireke tuj û lêgerînê salon oxilme kir, yek bi yek mirov kontrol kirin. Yek bi yek li şed û beda wan nêrî. Awira wî hat û hat li ser min rawestiya. Hah, min dît ku rast hat û hat li kêleka min rûnişt. Min di dilê xwe de got, ev Mistefa Kemal Paşa ji Xwedê ne xalî ye gelo, çawa bihîst ku kurê dostê wî, xwediyê keda mezin hatiye serdana wî, ev mirovê han î terz bajarî şandiye pêşiya min. Dilekî min coş dibû, dilê din di nava gumanên têr tirs de dişiliha. Mêrîkê terz bajarî çawa li kêleka min, rûnişt ji serê mitika qafê min heya bi serê teliyên min, bi awireke têr pirs nêrî. Bi awirekê dinêrî ku tirkêna gumanan ji dilê min hat.

ê fermanîdar, ku roja gonê li nava gundên Domana min.

ê min î ter qerqesûn de tirs mêran, bilî Babekirê Mistefê ku di mahkûmtiya xwe de, li dora qesra min pelo pelo dibû, ne ketiye dilê min.

Hin ji hêbet û tirs, hin ji coş û dilxweşiya pêçwaziyê min bersi- va mêrik da.

-Belê ez im.

Fişşân bi mêrîk ket û qet ne axivî, devê xwe venekir, pêça xwe ji min guhert, rabû li devê den da û derket çû. Min û hevalên xwe bi awirên vala li hevûdin nêrî. Pariyê me di devê me de mezin bû, me kir û ne kir ku em dikaribin bicûn û biqurpînin, ji me nehat. Bi darê zorê ew pariyê di devê xwe de qurpand û em rawestiyan. Mûrê me di cih de şikestin. Ev kî bû, ne kî bû, me newêrabû bipirsin jî. Tiştê ku kete dilê min, sîxurî bû. Dihate guhên me ku Mistefa Kemal Paşa ji çûkên hewayê bixwe gumanan dike û wan dişopîne. Lêbelê ez kurê dostê wî bûm, xwediyê kerd û keda mezin bûm û liqasî bavê xwe û bêhtir, jê re kiribû. Bila bi pirse. Bila qet çavdariyê bike. Ez li xwe ewle me. Ez sadîqê wî me, ez bende û parezgerê wî me, bêyî ku ew bixwaze, mirovên xwe bişînê cem min, min biryara xwe daye. Ne îro, bavê min dabû, min jî li pey şopa bavê xwe kudand. Şeveke bêhn birehayî û zexel, bi ser westandin û kasûltiya me de hêrivt. Ew sê roj bûn, ku em dût û dirêj li qonaxekê ranewestiyan e, lê sê bûyerên, ku 'xiçt'ên pêxwasên Amedê, di ser dilê me de rûnandin derketin pêşiya me.

Em kasûlî, şev bexîl...

Em westiyayî, şev zexel...

Em dilşikestî, şev giran...

U mîrîşka hêk zêrîn, ku me canê xwe di ber de daye, her û her êm û zadikê wê zêde kiriye sê gavan, ji me û wir de, bendeyî me bû. Eger nikilan nede...

didu... Ku bi quzê rût bi xelkê re diaxivî û bi quzê rut wesif û pesinê xwe dida jê re bûbûne bav û bira. Remo ne hînik bû, têra xwe kohne bû, dizanîbû kes û kûsan li dora xwe bidê hev. Qet ferezende ne dida hemberên xwe. Carekê bi tenê, yek carê, Siloyê Hito di nava

civakê de lebitî, destên xwe dirêjî derdoran kirin, rêz û benda xwe tevkir, rakire ser lepan, xelkê got, Remo ket û qels bû. Hew me dît ku topa Alaya Midyadê û Kerboran bi ser mala Siloyê Hito û gir-girekên rêza wî de girtin. Remo qas muxtarên dora xwe dabûne hev û gilînameyek çarşefr amade kir û bi muxtarê Hêştrekê, Dêrikê, Baqisyan, Zaxuran, Hexê, Gundikê Xecê, Serdêfê, Zazê û Roverê da mohr kirin û qista devê deristanê dewletê kir. Gilîname şande heya bi Ankara, ber kaba Mistefa Kemal û Ismetê Kerr. Siloyê Hito, Heyder û Şâxoyâ bira, û qas girgirekên rêza wî, bi tewan- bariya hevalbendiya Haco û têkiliya bi Binyaxetê û Xoybûnê re dane girtin. Bi salan mane di zindanan de. Ne hişt ku Siloyê Hito ber piyên xwe bibîne, rê nedayê. Ew Remoyê jêhatî, ku digot 'di berberiyê de minet û bêminetî çênabe, çawa derba te hat', hewqasî zîrek û têt finas, ketibû nava bêmirêsa hiyeke bê sebir. Teng dibû, ji gotineke ku ne em dizanin kî ye, guhê bezê bavê wî ji ku ye, gotineke ne li rê jî ne got, tenê pirsî û rê girt çû, xwe dixwar. Lê, ya Remo, tengiya wî, acizbûna wî ne mêrik bû, ne gotinên mêrik bûn. Ji Qilitê û vir de, dest pê kir. Ji Qilitê û gotinên berazbavê malîvanê m< ' ' " ' ' ^ " ;va ketibû. Remo ji bîr

ne

Fişşân li Remo ket û di ber xwe de:

-Zindiq in!.. Teva, bêjiyê piştî bavê ne.

Min gotin ji devê wî girt:

-Me xwe bi zindiqan ve girêdaye. Em bûne palê zindiqan. Gazin xêr nakin, semaxê bide xwe.

Remo li min nêrî:

-Sed carî lanet li wê roja ku nîr li ser stuwê me bû, bibare. Li her ser sê danê wê rojê ku kulabên nîr di stuwê me de bi duwêlan hatin şidaııdin, bibare.

Kesî ji me deng nekir.

Dilê zingarî em hejar kiribûn.

Demeke baş, heya Xanevan bi ser me de hat bêdengiyê domand. Ciwamêrê xwediyê xanê, di ber me de diket û radibû. Ne me bi tenê bi rêwingiyan teva re, ew bi xwe mijûl dibû. Kes bi hêviya berdestîkên xwe ve ne dihişt. Yek care bi tenê berdestîk bi ser me de ne şiyand, ew bi xwe dihat û bi zimanekî nerm û xweş pêdiviyên me dipirsîn, dianîne cih. Ciwamêr hat ku ser cifniyê tejî fîncanên qehwê kirine û li ber me danî. Çawa, ji cem me bû rast û çû, Remo li dora xwe nêrî, piştire awira wî hat û hat li ser min rawestiya.

Bi dilekî şikestî li min nêrî

-Qesem navê xwedê ye, kes ji hêstiipi me ji

Hêstirên Néron hatin bira min.

Néron ku di jiyana xwe de, wê jiyana bê wate û têr gotinên vala teva de hêstirên xwe di kûzik, ango kûpikê zêr de, mina hebirman û simaqa bi heft avan şîşti ber hev kiribûn, pişti ku Roma şewitand, pêdiviya barandina hêstiran ne dît. Çavkaniya çavên Néron zuwa bûbûn. Dema Roma şewitî, Néron helbest di nava agirê dilê xwe de bi awazeke kel- ogirî qiriya, kesî jê bawer nekir. Ji ber ku wî Roma sotî kiribû. Dilê daxdayê berhemê wî bû. Hêstir ku bi teşqele û deruwan bêne barandin, kes êdî ji hêstirên bi ratsî û qîrênên têr waweylê ji bawer nake.

Min bi awireke tuj li Remo nêrî û got:

-Li her cih û warî sertac û serkâş hene. Çima tu xwe di eyarên xwe de difetisîne. Malava, ne gotina te ye Remo.

Remo bêyî ku li min binêre:

-Em çi bêjin, em çi bikin xêr nake.

Beri ku ez bi axivim Remo berdewam kir:

-Niha vî kurî çima hat û çima li te pirsî? Gotina xwe mîna sixêfekê li nav ser û çavên me da û kesî ji me bavê xwe neanî bîra xwe û bi berstika wî ne girt, tiştê ne gotiyê?

Min:

-Malava Remo, belkî zîlamê dewletê ye, belkî zîlamê Mistefa Kemal Paşa ye, hat, pirsî û çû. Te ne dît, mêrik çawa kete hindur rêwingî teva ji ber rabûn, te va ew nas dikir.

Remo ji ya xwe nehate jêr:

-Çima em ji xwediyê xanê pirs nakin?

Yekî ji hevalên me:

-Dil aram bin, xwediyê Misirê melekê Misirê...

Min peyva wî birrî:

-Malava pêdivî bi tevdanê nîne.

Em westiya bûn.

Piştî ku me qehweyên xwe vexwar, lib libe em çûne ser cihên xwe. Cihê min û Remo li yek ode bû. Dawî ez û Remo çûne odê. Ode, ne gelekî fereh bû, bilind bû û banê wê ji hinduru ve kevaneyî hatibû ava kirin. Ser banê wê, rast bû, qubikî bû nizanim. Paceyê ku li ser deh kevirên rêzê hatibû hûnandin dirêj û teng, li rojava dinêrî. Şeva pêşî bû, hemberî teşqele û mêrikê terz bajarî, maşoqiya dîtin û axaftina bi Cenabê Paşê em pêça bûn. Çawa ez ketim hinduru, pacêya ku perda wê ber bi milê çepê hatibû kişandin bala min kişand. Derengî şevê bû, tîrêjeke ronahiya geş, li hev badayî li camên pacê diketin. Camên pacê çarçikî û parçe bûn. Lewra ronahiya geş li ser pacê parçe dibû û li navenda odê pelax dibû. Bala



min kişand. Rast çûme devê pacê. Hewşeke fereh, paqij, nîvî jê di nava zûrikê mil dayî hev de, nîvê din bi kevirên biçûk risimandî dibin pacê re dirêj dibû. Li nîvê hewşa fereh dareke zemanî, ku çengê sê mêran lê ne digiha hev, bi talaneke mîna çadira heft stunî bilind dibû. Avahiyek di temtêla kelihekê de, ne biçûk, ne mezin raserî dara zemanî xuya dikir. Paceyâ keliha biçûk ya hemberî oda xanê vekirî bû. Ronahiya odê, mil dabû hev û ber bi hewşö diverişîha. Li gastînka binya pacê, mîna miştaxeyeke mezin bela dibû.

Min li darê, li talana darê, ku di nava reştariya şeve de weke gurîfeke reş li hevûdin hatibû pêçan nêrî.

Dara bi tenê: Nîgarî û xemla hewşâ, berzî û ronîya kelihê bû.

Ocaxa ku tê de nebe agir û kar, mala ku tê de nebe qurmik û dar, nabe xeml û xeyala giran û navdar...

Dara bi tenê...

Kerdên tukesî di stuwê dara bi tenê de nînin.

Jiyanaka xwe ser, rizgar!.. Bê kerd û tun!..

Dar li ser qurm û koka xwe şîn dibe, ra û qoratên xwe di nava rewa erdê de berdide, heya digibe malzaroka axê ku dikaribe ava jiyanê bihince. Lewra xîret û rûmeteke darê heye ku heya can di bedena wê de heye na tewe, li ser qurm û koka xwe şipö dimine, stikura xwe xwar nake. Hemberî avê, ba û oabexîlkê serê ser jêr nake. Heya roja dawî... Ji bo bijîn, ji bo jiyanê berdewam zîyanê nadin canlîdaran, pêdiviya kuştina tiştêkî nakevê dilê daran. Lewra di çanda me de bûye sembola jiyanê. Dara bi tenê, dara bizmara, dara hêvî û daxwazê... Gezo şîraniya dilê darê ye, li ser pelê darê digihê hev û xwirîniya jiyanê dişikîne, pîrozî ye. Berû, tovê kakil şikandî, dermanê êş û derdên bê derman, hêval û hogirê Lokman Hekîm, ku di tûrikê wî de, her dem, her dem neh-deh berû hebûn. Baxçeyên

dilan bêyî kulîlk û bilbizêkên evînê, baxçeyên jiyânê bêyî dar û devî çênabin. Mirovaniyê pêşî xwe li tor û bextê darê girt, li ser çiqliyên wê malên xwe çêkirin. Dar parastina pêşî ya mirovan e. Piştê şikeftin. Di şikeftandê jî dar bûne parazgerê mirovan. Bûye çek, bûye daqoq... Kurdan dar pîroz kiriye, kirine Xweda, bawerî pê anîne, bizmar li darê dane hêvî kirine. Dar hêviya jiyânê dide. Hêvî, ku di nava rewa erdê de, li ser gulî û pelên darê şarîn dibe. Darê agir daye mirov, çawa heste li kevir ketiye, pûşî xwe daye ber çirîska agir, pêketiye. Bilî parastinê, mirov germ kiriye. Dar bexîliyê nas nake. Tenê ye, mil dide hev dibe darîstan, bizrê yekîtiyê avêtiye, dibe sinsi!. Xiyanetê nizane. Pêdiviyê bi para kesî nayîne, destên xwe dirêjî para kesî nake. Axê dixepêre, bi xwe debora xwe dike. Destûbirakê kevir û kuçan e, evîndarê ax û avê ye. Çiya bi dar geş e... Deşt bi dar xweş e... Bilbil bêyî evîna gulê dengê xwe xweş nake.

Cîhan wargehê jiyana darê ye û par venake. Zext û zora sînor û tixûban nas nake. Li her wargehê serê xwe radik<sup>^</sup>di nava kevir û kuçan de, di nava av û axê de... Sembola sebir û berxwedana mezin e.

Dara bi tenê... Xweser û azad.

Di nava gilî û govenda xwezayî de, «ngê polayî ya keliha birca dilên evîndar e. Dara xemla jiyânê, kirasê atlasa dilê çiyarêzan e. Tîr e, kevan e, jih e, desti ye... Stara teyrik û tûrikan e, sîwana hêlkîn û çêlîkan e... Ne tenê ax, ne tenê av, ne tenê hewa: Lingek ji yê jiyânê ax be, lingek hewa<sup>^</sup>be, lingek av be, lingê çaremin dar e.

U agir...

Agir bêyî darê, dil nade, na çirişe.

Dara bi tenê, bi ronahiya rojê re dikene, bi mehtaba heyvê re dibêşê. Geşiyek bi ser de dixumihe nayê gotin...

Çiqasî bêjin Adar xedar e...

Ku li mal hebe koma dar e...

Kulîlka demsalan xweş bihar e...

Mina rcşbeleken helbestbavanekî ku helbest û pirtûkên wî di tûrikên wî de hilandî bin, tenê ew bixwîne, min jî gotin li duv hev dikirin rêz.

Bizavtina bayé seqemî ku cûzanî dibirrî, cih dabû bayekî nerm ku li nav pel û çiqlikên dara bi tenê dîlan girtibû. Nerme, hûrik hûrik, tenik tenik dilorand. Dengê zirav, di nava lorandina neyê de difûrî, dikelî, diherikî, ji paceya keliha biçûk, mîna ava bestika gulbijêrkan nerme nerme diherikî, dihat. Ku deng dihat, ba radi-weste, xwe bê pêjin fikir, rê dida gotinên bi dengê ku bi neyzan re diliviyên. Car carinan deng lewaz dibû, ba diliviyên û baskên xwe bi nermî dirêjî deng dikirin, ba û deng li hevûdin dihatin pêçan, bi hev re, bi lorandineke evînê pêl didane xwe.

Dengê keçekê bû, bi fûrandina neyê re, di renekî dîw

Zembîlfiroş digot.

Ey dil werin dîsan bicoş Carek ji caran mey binûş B ikin qiseta Zembilfiroş Da seh bikin hikayetê \*

Ney û dengê keçikê li hevûdin dihat. Her du mîna hev nerm û zirav, mîna hev dîl, di koka herî nizim û nerm de, ji kûraya dil derdiket. Her du mîna hev bi derd û kul bûn. Her du mîna hev evîneke şikestî dilorandin. Bi awazeke dîlzarî... Dema Neyzan zirav fikir, keçikê dengê xwe bilind fikir, dema keçikê dengê xwe kêr fikir, Neyzan pêl didane lorîna xwe, bilind fikir. Gotin, dema ji nava lêvên keçika dîlzar derdiketin nefesa Neyzan di nava qulikên ku dibin teliyan re

diloriyan, kelogirî dibûn, difûriyan. Ba û pelên darê li ber ney û dengê keçikê, di nava mehtaba huzmeyî de, ketibûne halweta ayînî. Carinan ba û pelan, bi dengê ney û keçikê re dibû bilbil û bi lalezarî dibeland. Xuşşân bi talana darê diket. Dema talana serê darê li hev diget çirîsk û stêrikên ronahiya mehtabê, bi gurriya ronahiya ji pacê Welî dibû, di nava hevrîşmê şerbeta lêvan de huzme didan. Geh deng sohtî fikir, geh xuşşêna darê, geh ronahiya mehtabê... Xalên bi ember û miska evînê hatî pêçan, pêl û bawêçêneka xeyalan  
Mele Ehmedê Batê (1417 - 1491)

direşandin. Şev mest... Deng xoş... Ney zilfa yarê dixwest... Geh lor, geh dor... Dir û yasînên têr hêvî darvedikirin. Huzme serûbinî hev dibû, bi dengê keçikê û dengê Neyzan re û nav ser û guhên hev diketin. Dengê keçikê, dengê neyê, dengê ba û dengê pelên darê... Çirîsk û bircikên ronahiyê... Miço-belo dibûn. Di nava rîtmeke ku bi nota hetibû sazkin bi ser çemê... Ava Mezin de pêl didane ?

Azariya şevê şikestî, kilîda zincarî vekirî...

Xuşşêna avê, nermîn, nazedar di nava xemleke têr maşoqî û maqûlî de li qerax û kevîkên dilê evîndaran diket, kulîlk û gulbi- jêrkên rengîn vedikirin. Kesera jina Mîr, rebeniya Zembilfiroş, keribî, di nava kirasê waweylê de, yek evînî, yek xizanî... Dengê keçikê, ney û avê: Dengê dergûşa bê zarok û lorandina dayika bê dergûş, dengê bêrîvana bê doş... Dengê nesrîn melal û ebrû helal, dengê reş û tari, ken û girî...

Şev di nava neylorandina evînê de serxoş bû. Tevzînokên ser dil, hingavtina dilê guvaştî, axên û keser, hew gidî, gazinokî, di ser serê hevûdin ve digevizîn.

Û ez...

Mirûsê Remo...

Kevçika dilê kûrkusî, dinava heft şikêrên axirzemanî de, welî kirî, hîna şermokî ne, tirsonek in.

Û me hîna xwe, hîna mala xwe, hîn agundî û cîraqnên xwe nas ne kirine. Zevî, rez û werzên xwe, pez, dewarê û sewalê xwe nas ne kiriye. Dîrok, coxrafya, stran, çand û hewnê xwe nas ne kiriye. Em di nava zikreşiyêke wilo meizn de têne guvaştin û biçûk dibin ku jes nikare navekî lê bike. Mirovê ku xwe, mala

Xwe, rastiya xwe nas neke, hêvî jê nabe, ji cîhanê, ji rûmet û paşerojan bê hêvî ye.

Bê hêvî bûn mirina bi saxî ye...

Zembîlfiroş çûn reng û reva Lê şikestin ejmû û gave Tevizê da dil û hingavê Got: 'Li eslê minda eva nave

-Lawkê nezan. Tu çima şermînî Silav bike van memkêd zêrînî Tuê ji wan xêrê ji xwe re bibînî Te ez bi dil û canva birim Te nebînim, ez dimirim

Dengê dilekî ronîbîn, dengê keçeke dikir. Ji nava cewherê dil, bi dengê jiyânê dilîliyand. Cewherê dil, bi keleşiyêke germ diçirisan. Kelhoşkân di nava xwîsiya destpêka Zivistanî de mirûs dayî... Derengî şevâ, di odayekê de bi dengê neyê, bi ba û pelên dara bi tenê re, di newirand. Bi hêviyên têr raperîn, bi hêviyên têr guman, hemberî jana zordestiyê, ji bo ramûsanek cangorî bang dikir. Tî, birçî... Destên evînê dipalandin. Qurfêna dil, dilê tî, birçiyê germahiya kefa mista yarê!.. Yara belengaz, dîlzar, stu lelekirî... Di zîndana xîzaniyê de selik di hûnan... Bi hêvî, hêviyên têr raperîn... Xwe digihande Ava Mezin û ber bi kûraya dilê Mezopotamya, axa têr xwîn, bi xwînê hatî avdan, axa bi xwêhdana mirovan hatî şuştin, pelû dibû, diherikî. Kevirê şekirî, bi avzêmkê bê av dikewand. Dil û şûre ahenî pjmn, piştire av dida û dikewand. Paceyê dilê keçika

dîlzar, bi paceya odê re vekirîbû. Dengê dîwanî û Neyzanê dîlzar bi hevûdin re... Di nava keşkûliya şeva reş-tarî de, bi reng û ronahiya astar û mehtabê qesebkirî, bi xeftanê melez-î neqîşkirî, pêçayî... Bi nefes û gotinên di nava nota de sazkirî... Li ser perr û baskên ba û rûdêna pelan suwar dibûn, ber bi dilê jiyane diherikîn. Mehtab şermok, perda ser rûwê xwe hilda bû, hemberî reş-tariya bêar, ku bi ser cîhanê de daw û delingên xwe hilweşandibû. Reş-tariya bâşerm... Mêhtaba aşüfte... Mehtaba lalezar di serê govendê de dîlan girtibû. Mehtaba nazedar desmala evîne, di serê govendê de dihejand. Mehtab, dengê keçikê, dengê Neyzan, ba û belgên darê, xwîsî û pizrkên ronahiyê... Dengê keçikê, dengê neyê, ba û pelê dara bi tenê û mehtab bi hev re, di nava neqş û xeftanê cewherê dilê meşk û eşqê de sarxoş pelû dibû, diweliya, bela dibû.

Delalî, çima gelo, çima hewqasî şermok e? Çima gelo!.. Xweşikahî bi nazedariya dilekî şermok awir şikandiye? Çima gelo!... Bilbil hewqasî lalezar e!.. Çima?

Çima nesrîn ji xwîne sor in, çima guî hewqasî keseran didare, dike bergê dilan? Çima?

Cîhana bûyî efsûn... Dergehê li ber evîne hatibû kîlit kirin, bi 'bezma meyxur' vedikir.

Ferehî digirt, ferehiya navbera dil û evîne; ferehiya ketibû navbera çiyarêzan. Ferehiya di navbera deşt û newalan de; ferehiya di navbera pismametiye de... Pêl dilê min dikir, pêl dilê min... Bi dîlzariyeke maşoqî, dadigirt. Dixwest... Dest bide her du basikan. Dest bidê dest, dest bidê dest...

Remo li ser cihê xwe dirêj kirî li kevana zikê odê dinêrî û dêhnê xwe dida ristin û hûnandina zikê ban. Bi hostahiya sazbandê avahiyê mijûl bû. Ez li cihekî din, ji nava keşkûliya dilê di nava bûyerên

fetsînokî de pêçayî dûr, li cîhanekê din bûm. Dengê keçikê, nerme ber bi ba dibû, dilê Neyzan difûriya, dilê min dikelî. Bi dengê ney û keçika dîlzar re, di nava mehtaba evîniyê de, bi perr û çeng li nav ser û guhên erd û eman diketim. Bêhnikeke baş, bêdengiyê domand. Piştî bi demekê, tiştêk tê bîra Remo, dixwaze bêje min, bêyî ku li min binêre dibêje. Demekê bendeyî bersiva min dimîne, dinere ku deng ji min dernakeve, li ser cihê min dinêre, ez nînim. Radibe li ser kelefên quna xwe rûdine û dinêre, dinêre ku ez li ber pacê me, di nava bêdengiyê melûl de dipêjinim.

Bi dengêkê têr yarî:

-Te xêr e Hiseyno? Tu bi halwesta ayma şeve mijûl dibe? Ez ji ayîna gerdûna dil, ji xewneke bê xem hilçeniyam.

Dengê min weke ku ji bîreke bê binî derbikeve.

-Tê got çî Remo, min dengê te nekir?

Remo bi dengêkê ku di nava bêbaweriyê de fetisî be, gotina xw» dubare kir:

-Te xêr e, te xêr e gidî, li ber pacê? Mehtabê tu girtiye nava Gotinên Remo yên têr yarî, xeyalên min hêrivandin.

.s£

Remo nêrî ku bêdengiya min didome, gotin guhert.

-Tu jî di bê qudoşiya me dirame?

' ' im: i1

. , t guhdari>

Bêyî ku Remo bersivê bide, min berabwam kir:

-Tu çîroka Zembîlfiroş dizanî?

Remo bi awireke matmayî li min nêrî. Weke mirovekê bêje, Zembîlfiroş ji ku derket. Ev zilam xeyalan dibîne bavo. Hiseyn û evîn?.. Mirovê ku li ser dilê xelkê bilind bûye, kursiyê xwe li ser dilê

kes û kûsan, li ser xizaniya zarokên sêwî, jinên bî daniye!.. Evîn, Zembîlfiroş û ney... Û Hiseyn çî dibêjin e hev. Kî, kî vê şeva han, kî wê li ber pacê raweste û Zembilfiroş jê re bi lorîne, pif bike serdilkê hestên efsûniya neyê?

-Hiseyno, xwedê jê razî, tu çî dibêje, kê ji te re Zembilfiroş lorandiye? Tu xewnan dibîne. Derdê me ne besî me ye, çima?

Awira xwe ji min qut nekir, serê xwe hejand. Xwest axaftina xwe bidomîne.

Min peyva wî birrî...

-Remo, bi serê bavê min û te, di avahiya hemberî oda me de, dengê melûl, nerme Zembiloş bi dîwanî digot, ku min di jiyana xwe de ne dengê wiha guhdarî kiriye û ne ez dikarim, wesif û pesinên wê bidim. Bi dîwanî re, dengê neyê dilorand, ba û belgên dara zemanî ku di nivê hewşa mezin de bilind bûye û bi talana serê xwe ezmanê hewşê teva giitiye, bi mehtabê re dîlan girtibûn.

Car din... Car din... Çetelê dilê min vezîlel

Awira min çû ser kevana zikê banê odê, lê mêjiyê min, dilê min dibin melûliya dengê keçikê û dengê neyê de bû. Min kir û nekir, zimanê min gotinek çênekir ku ez bersiva wî bidim. Zimanê min, giran bû, lêvên min hişk bûn, şikefta devê min zuwa bû.



Remo careke din berê xwe da min.

-Te dengê min kir ne wisa?

Min bi dengê bê taqet bersiva wî da. Gotin hinekî bi hêrs ji devê min derketin.

-Belê, min dengê te kir. Lê, xwedê dizanê ku dengê hîr-hîra keç û xortên Hêştirekê, Zazê, Seyîdên Kefsengê, Bêcirman û derdoran tu



fêrî 'xurfanî' kirine. Bilî 'xurfanî' deng û awaza stran û leylanan bi te xweş nayên. U yarî û gotinên çilp-tazî yê Peyrûza Deywanî...

Xurfanî, ha xurfanî... Peyrûza ha Peyrûza... Quzê rût û Bamizrût...

Peyrûza Deywanî, ne jin bû, ne tenê jin. Bela xwedê!... Ku pêl dilê mêrên li ser navika xwe dibirîn dikir. Erê jinek bû, jinek axa bû, textê xwe li Deywan danîbû, li nava Erebiya teva kê dikarîbû

bêje ez mêr im. Ez bi simbêl, ez bi gunik û nêr im. Mêr dicesandin, li heremê mêrekî nexesandî nehişt. Zuwa serî diqusandin. Peyrûza Deywanî ku li ser hesp su war û bi kîr û quz bi xelkê re diaxivî... Şur û qamçiyê dewletê di destên wê de, bi Kazim Beg, mudurê nehiyê, dest û piyê dewletê re difîqand.

Bi gotinên xwe re poşmaniyâ ez girtim. Pêdivî pê nebû ku ez li Amedê, ku me qista Mistefa Kemal Paşa kiriye û roja pêşî dilê wî bişikînim. Remo mirovekî köhne bû, dilê xwe ne digirt, car din, car din pêdivî pê nebû. Dost bû... Dostaniya min û wî kevin bû û li ser yek bingehî, li ser kefa mista Mistefa Kemal Paşa ava bûbû. Bavê min û bavê wî... Ev biryar dan. Em di çalê de bûn, bê biryar, û me, me bi serê werîsê wan girt.

Min berdewam kir:

-Ez tiştêkî ji avahiyên fam nakim. Ez ne sazbandê Birahîmê Hewşo me ku ez ji hûnandina avahiyên fam bikim, ezê di derbarê kevana zikê odê de çi bêjim.

Fişşân lê ket û di nava bêhtengiyekê de axivî:

-Maleve, îro çend roj in ku kelem û hej di nava lingên me de ne, ji roja ku me daye rê û vir de, ji nişkê de derdikevine hemberî me. U tu qet li ser bâqudoşiya ku li me raselitiye dengê xwe nake.

Min bi dengekî nerm.

-Xwedê jê razî, heya ku em Mistefa Kemal Paşa nebinin, tiştêkî jê fam nekin, pêdivî bi gotin û galgalên vala nine.

Remo gotina min qut kir.

-Xwedê kur hiştî, ev ciwamêrên bi me re hatine, bendeyî te û gotinekê ne, qet... Hewce nine ku tu bi bêdengiya xwe pêl wan bike. Min gotin ji devê wî girt.

-Ciwamêr, em hatine ku Paşâ bibînin. Em heval in, em hevalên hev î rêz û bendê ne, çima pêl wan bikim, ev çî gotin bû Remo, xwedê jê razî wilo nerame. Em bi hev re ne, bi hev re dirabin rûdinin, radizin, di mêvandariyê de, di rê de bi hev re ne. Çî dibe dizanin. Pêdivî bi gotina min heye gelo.

Remo xwe ne girt ya dilê xwe ferîşîha û gotin anî ser şeqama mêrikê Stewrî:

-Ew şeqama mêrikê Stewrî li rûdêna me teva ket. Ne te dît bê ji darî me ve çî gote bêjîyê xwe?

Ez hêrs bûm:

-Xwedê kur hiştî, roja pêşî me qîma xwe bi gotin û şeqamên dijberên xwe aniye. Me pişka xwe li cem Mistefa Kemal Paşa daniye, hemberê me di nava refên xwe de ne. Helbet li xis l hesabên wan naye. Em pêl wan dikin, em xwe tebayî wan nakin. Ew jî li me namînin heyirî... Her tişt, her tişt hemberî hevûdin e...

Bêhnikekê min gotin qut kir, lê nêrî û berdewam kir:

-Em jî li wan, li xizaniya wan, li koçberî û wêraniya wan namînin heyirî... Ne wilo?

Remo bi dilekî şikestî:

-Ya mêrikê Stewrî çibû?

Gotinên Remo, ne ji nezanîn bûn, naa, dixwest ramanê min fêr bibe.

-Rêz e... Ji Midyadê heya bi Ankara rêz e... Kazim Beg!.. Kazim Beg, kes nizanê bezê guhê bavé wî ji kûderê ye, Tirk e, Ereb e, Amawut e, Rum e, Laz e, Çerkez ?... Kes nizanê Remo, lê, Kazim Beg, li Kerboran li ser kursiyê dewletê rûniştîye û dibêje de here wan, here xêro, here dêro, destewcwe daye pişta te, tu dikuje, tu talan dike, tu ava dike, tu wêran dike, kes nikare bêjê te, serê sola te bi tozik e. Te bi Kazim Beg pişta Siloyê Hito şikandiye. Ev rêz e Remo, rêz û bend e... Siloyê Hito, hemberê te ye, her dem daqoqê dewletê li ser serê xwe dibîne, ne hêza te ye, hêza dewletê ye ku dilê Siloyê Hito, dilê Zaxuraniya, dilê Endrirawusê Kerboranî zîz dike, diperçiqîne. Ev e rêz, ev e bend!.. Ji erd heya bigihe erş rêz e. Pêxemberê 'xir-zeman bi şurê xwedê berberiya xelkê dikir. Ew jî rêz û bend bû. Remo, qey tu nizanê ku dipirse?

Remo bi nalênê:

-Naxwe pişka me!.. Pişka me li gotin û qeşmerî!..

Min dizanîbû ku Remo wê gotinên giran bêje. Hinarkên rûwê wî dilerizîn, reşikân çavên wî biçûk bûbûn.

Ez rabûm li ser qelefên quna xwe runiştîm.

-Maleve Remo, te xêr e? Ez bêjim tê bi inire, ku çavên te li Kazim Beg dikevin, reşken çavên te direqisin. Te Kazim Beg, te Ankara daye pişta xwe, te destên xwe dirêjê heya bi nava Erebiyan kiriye, kes nikarê bêyî te biçê livîna xwe. Dilkuliya te çiyê îcar? Remo hinekî hêrs bû, car din pêl xwe kir, bi nermî:

-Min ked daye Hiseyno, mîn xwîna xwe daye.

Bêhnikê deng ji me her du wan demeket.

Min bêdengî xera kir...

-Remo, tu jî dizane ku em nizanin serê me li ser çi balgihî ye. Emê Paşê bibinin, nebinin diyar nine. Dema me dît, emê dikaribii çiqasî

bi hevûdin re biaxivin nizanim. Kî dizane, belkî... Belkî mî:..\_ ê Mala Perîxanê, kerdên me bibe toqê lanetê û bikevê stuwê me. Remo careke din rabû ser kelefên xwe rûnişt û bi dengekî bilind: -Ya dawî ev e, ew toq di stuwê me de rûniştiye. Rast e, xilafî tê de nine Hiseyno. Gotina te bi serê min ket.

Bêhnikê rawestiya û gotina xwe domand:

-Belkî em wî nebînin... Belkî mêrik!.. Mistefa Kemal Paşa, ne Kazim Beg e. Mêriko li ser kursiyê padîşahê bi tenê, xelîfê ola îslamê, mîna daqoqê erd û ezman rûniştiye. Em, em çend perûtkên çengo kirî, li gorî wî çêlikew in, ji Midyadê hatine. Dikare me nebîne. Dikare daxwaza me bi nivîskî bixwaze. Dikare!.. Dikare mêriko!.. Hingî... Hingî emê çi bêjin xelkê, gelo emê çi bikin?

Pişkoka tirhika tirsê di dilê min de pişkivî.

Valahiyek, sar, bizdihayî, herhilî di nava babexîlka berf û baranê de pêçayî, di sînema sînga min de ferîşiha, bela bû.

Me biryara xwe dabû. Dawî: Bijartina me baş ketibû, heya îro baş bû... Eger niha lingan li me hildin, pêwist e ku em bi çarenûsiya xwe razî bin.

Emê çi bikin, çi bêjin! Dibêjin ku dostanî, hevalbendî jî kevin dibin. Dem pêlstikuriya li her tiştî dike. Hembeî çarenûsiyê, stuwê me lelekirî, destên me kelepçe kiri ne. Me bi destên xwe û biryara xwe, nîrê bendetiyê pejirandiye. Bayé me rabûbû û li gorî kêfa dilê xwe, me hildidêra. Ku niha bayé me bête guhertin... Emê hingî ber bi xwe bimeşin. Ber bi dilê xwe bimeşin. Da kes nikaribe pêl dilê

CENABÊ PAŞÊ

Deriyekî nû ku ber bi cîhaneke nû vedibû.

Dengê neyê...

Dengê keçikê...

Zembilfiroş bi meqamekî dîwanî...

Û dîtina Mistefa Kemal Paşa... Kilîda dilê min î zingarî, ku di nava salên têr qolincî û gazinokî de pelixî, mabû neşikandî.

Heya sibehî, xeweke xweş û sivik ez pêçam.

Şev westiyeyî, di nava xam xeyalên birçî de, bê wens, bêyî riya xwe bi min bixe derbas bû... V

Min dêhnê xwe dida hevalên xwe, mîna min ew jî di nava dilcoşiyêke mezin de bûn. Şadûmaniyâ ew jî pêçabûn. Xewa kêsî ji wan ne dihat. Heya berbangê geh rûniştî, geh dirêjkirî man. Bi berbangê re, ku melê got 'allahûekber' me berê xwe da Welî Camî. Min di bîraya xwe de limêjeke hewqasî ji dil û mirazan nekiriye. Hevalên min ku di temenê xwe de aniya xwe li erdê nedabûn, destlimêj girtin, di nava mikewniyêke olparêz, bê çiqasî nêzîkî Cenabê Paşe bûn, hewqasî nêzîkî Xwedê limêj kirin. Gotinên limêjê dizanîbûn, nizanîbûn ew û wijdanê terikî, gunehên wan distuwê wan de. Heya wê rojê mîna bextê Iskanê Gulîxan Axa ku hemberî Memedê kurapê Seyrê nîşan dayî, bi mehreke çaroxî nêzîkî olparêziyê dibûn. Her roja xwedê pêl bextê xwe dikirin. Icar niha!.. Nizanim, ew û bextê xwe. Ez ne di dilê wan de bûm û weke min dirabûn, weke rudiniştin û lêvên wan diçûn û dihatin.

Destpêka Nîsanê bû...

Adara xedar, Adara şûm, şûre keskûniya Zivistanî ji destên xwe dananîbû.

Serma bû, serma ter seqemî difûriya. Bayé cûzanî, dibirî, bayekî tuj î dijwar dihat, bayek diliviya ku di nava sû-kirina kerkerên Ewertê dibirrî. Piştî limêjê, li aşxaneyêke ji wan, ku bi çemçika mezin xwarin didan û arzan, me xurîniya xwe bi şorba nîskê şikand û bibez em

çûne devê Sara Walî. Kes nebû, çend mirovên ku paqi- jî dikirin li wir bûn û bes. Me ji wan pirsî, gotin li wê gastîne rawestin heya ferman dar bê. Gotin ji nava lêvên wan bi kasûliyeke têr zexelî, bi zorê derdiketin: 'Ferman dar, ji bo mirovên tene ser- dana Cenabê Paşê, zu tê, armanca wan dipirse, biavê wan dinivîse. Herin dei~ve heya bê, werin.' Çameçar!.. Bêbavên Şamâ, rîya derve şanî me dan, em ne girtin hinduru. Di nava westandineke neqam de berê me da wê gastîne û dest bi karê xwe kir. Em ne xemgîn bûn, dema ferman dar, yan jî walî hat, emê xwe bidin nas kirin. Em ji welatekî dûr hatine û kerdên me di stuwê dewletê de hene. Wê bi dilcoşî, bifermoyî me bikin û li cihekî germ rûnînin, çay, qehwê bifermoyî me bikin, kengî Mistel | Kemal Paşa hat wê me qebûlî dîwana xwe bike. Ronbîniyê em pêça bûn. Li wê gastîna ku ba, ji her çar aliyan ve dihat û li hevûdin digeriya, bi himmên û fiqên li hev dihate pêçan û bi gurreke dijwar dirêjî me dibû, di nava saetekê de em bi ser hevûdin de guvaştin. Qaputên me jî nebûn. Saet ne dibûrîn. Çare!.. Em mîna girtiyan diçûne vî serî, dihatin wî serî. Hah me dît memur û ferman dar û karmend teva, li duv hev hatin. Me sebir kir m 'à li hinduru rûnîn û bêhna xwe berbidin, çaya serê sibehî vexun, çavên wan ji keşkûliya xewê vebin, piştî emê biçin. Piştî hatina wan bi niv saetê em çûne sarayê, devê deriyê ferman dar. Me li derî da û çûne hinduru, bi zimanekî rêzî derdê xwe jê re got. Ferman dar yek bi yek li me nêrî, deftereke qilpax qalîn vekir li rûpelekî navên me yeko yeko pirsî û nivîsî, li saeta xwe nêrî, bêyî li me binêre destê xwe dirêjî derve kir.

-Hunê herin derve û di rêzê de rawestin. Cenabê Paşê wê saet di yazdehan de li vir be. Ku hun dirêze de dîtin wê bête cem we. Eger hun ne dîtin û bûrî, ezê daxwaznameye we û navên we bigihînim

Cenabê Paşê. Binêrin, xwe nedin alîkî, ez bêjim û bangî we bike, yan jî bê cem we, hun ne li wir bin... Fermana serê min e, lê ez jî, ezê fermana serê we rakim. Xelasiya we ji destên min nîne. Min derewîn demeyêxin.

Bi dilekî şikestî di nava kevzê de pêçayî, em derketin derve. Ya rastî... Ya rastî hêviya me ew bû ku me li hinduru rûnîne, çay- qehwê bifermoyî me bike. Em!.. Xwedê giravî em, mêvanê Mistefa Kemal Paşa bûn. Em ezîzê wî bûn. Qonaxa sê rojan, li ser hespan, geh bi teleb, geh bi rawanî, geh bi çargavkê, qista wî kiribû... Malava!.. Malava ev Tirk ne ciwamêr in, raste ku nanê wan li ser kaba wan e, gelo çima, çima mêvanên xwe li derve dihêlin? Remo rast dibêje gelo?

Gelo!..

Bayé seqemî çawa difiqînê çawa difiqîne, azinellah. Ji anîşk û bertengên avahiyên derdoran difûrî û li hevûdin dihate badan, gur-rên pê diket û dibizivî. Dibirrî... Em çûn û durî pêpelûkên dergehê derve bi çar-pênc metroyan ketin rêzê. Ez di serî de bûm û min amadekariya xwe û patê û xwendina kunya xwe dikir. Serê kêlîkekê lêvên min diçûn û dihatin. Rastî min dersa xwe, xweş ezber kiribû. Weke ku fermanar got, Cenabê Paşê di saeta xwe de hat û ji trimbêlê peya bû. Me xwe bi lez û bez da hev. Li dora xwe nêrî, qedera saniyekê çavên wî mane li ser me û bes, pêça xwe neda me, berê xwe da dergehê Sarayê, bi pêpelûkan de hewa ket. Walî, paşa û girgirekên din di pey de beziyan. Femandarek li pêpelûka jor rawestiya û li me nêrî, tişteke gote femandarê xort yê kêleka xwe ku yawer bû û derbas bû hinduru. Xortê zirav û dirêj, mîna mîrekekî di nava kinc û nîşaniyên eskerî de pêçayî, ber bi me hat. Em dirêzê

de û birêz bûn. Serî li hewa, sîng li pêş û awir ne şikandî... Hat û hat li ber min rawestiya, pête ji min re da û pirsî...

-Derdê we?

Derdê me!.. Hêka zêrîn bû, gihaye ber destên me, ez destê xwe dirêj bikim, vaye, li ber min e, ezê rahêjimê. Hêka bi xwînê zêrîn bûye, çengekî nêzîkî min bûye. Ez gavekê biavêjim bes e, gavek bi tenê, dikevê destên min. Hew gidî, hewqasî jî dûr e, hewqasî jî dûr e mîna hêka Teyrê Sîmur, li serê çiyayê Qaf e, ku bi qonaxa mehan û salan ez biçim nagihimê. Qonaxeke dûr û dirêj e. Ne hindikî, ne qonaxekê ne salekê, ne diduwan, çend salan, di temenê xwe de ser- anser em beziyan, ber bi hêka zêrîn, hê jî em negihanê. Navber

GeloL

Reşbîniyê ez pêçam.

Min dursa ku ezber kiribû nîve nîvî jê re got û dawî:

-Em ji Midyadê, payîtexta Tora Hevêriya hatine. Em teva serekeşîren bendê dewletê ne, ku me teva bi sala serekçetê kiriye û kerdên me distuwê dewletê de hene, em kurê dewletê ne. Sê rojên me ne ku em birê de ne, daxwaza me ew e ku Cenabê Paşê bibînin.

Permandarê ciwanik serê xwe hejand û kaxezek ji berîka xwe derxist, gotinên min bi lez nivîsîn û navê min û girgirekên bi min re nivîsîn, bibeç çû hinduru. Hinekî dilê me xweş bû. Lê serma mîna cûzan rewşa me nexweş dikir. Her diçû lêvên min sar dibûn, zuwa dibûn. Ez ditirsiyam ku dema Cenabê Paşê hat, lêvên min neçin neyên, hetîketiya mezin ew bû. Heya ji min dihat min hilma xwe bi ser lêvên xwe de berdida. Carinan min lêvên xwe gez dikirin. Saet li duv hev dibûne rêz. Lingê me hişk bûn, derman di kabokên me de nema. Piştî demekê me dest bi reqsa xurfanî kir. Lingek dihilanî yek



didanî. Bû nîvro tune, bû piştî nîvro, tune... Birrên eşraf û kubkubeyên bajêr dihatin, dibin çavan re li me dinêrîn û diçûne hinduru. Me newêrabû ji cihê xwe jî bilivin. Fermana qumandar hebû û gotibû ji cihê xwe ne cewciqin...

Mîna marekî di tengasiyê de, kuffên bi Remo diket.

Xwedê dizanê ku ez neweyiyan nakim. Mêş li hewayê, çûk li hewayê, ji sermayê hişk dibûn. Her cara ku bayé seqemî dibizivt, mîna şiva tîrî kersivanî, bi himmet û hêrs li kevçika pele guhên me bikeve, şewt ji hinarkên ruwê ma diçû. Çavên me hêstirên zuwa, cot cot dibarandin. Bayé seqemî çavkaniya çemê hêstirên me zuwa kir. Lîkitka me diniqutî serê tûjika pozê me, dibû zembelîlk. Bû esra teng ku mirov li bayé bezê destlimêj negire, limêja esrê dibûre û Cenabê Paşê daneket. Hin ji serma, hin ji hêbeta xwedê, min ' hevalên xwe: -Gidî em limêjê li xwe nebin, di vê navberê de parîk nan bixun, wilo biçe emê ji qerem bikevin. Ji berbangê ve em li ser mgan qurimîn, sermayê em çêkirin. Bavo, qey çî qewimiye!..

Kittên li yekî ji wan neket. Qufilbûn. Reş qeliya bûn, ji serê teliyan heya bi mitiqa serê wan di nava lerizandinê de dihejiyan. Li bayé bezê em ber bi hewşa mizgeftê beziyan. Bi ava sar destlimêj girt û bibez çûne hindurûwê mizgeftê, ri seferî çend caran em tewiyan û rabûn, ayat û gotinên limêjê tevlihev bûn, lêbelê me ji stuwê xwe kir. Ya rastî gotinên ji devê me derdiketin jî mîna dilê serma girtî, lêvên sar ku hew dikarîbûn bilivin, seqet û kuloke dihatin û li hev diterpilîn, ji devê me de dipekîne ser cilika limêjê. Me limêj jî, bi seferî ji stuwê xwe kir. Bi wê bez û lezê me xwe avête aşxaneke çemçik mezin û arzan. Tirşik û goştê dinava avê de Hazir û amade!..

Wê rojê heya esra teng, roj li ber ava, em mane li ser lingan û zîq rawestiyayî. Amade, hazir û nazir!.. Esra teng ku tava rojê di nava xemla zer û xemrî de li asoyên gerdûnê pelax dibe, xortê yawer ber bi me beziya hat.

Perda ronbîniyê xwe palande ser dilê me.

Xortê yawer pate da û bi zac gotin li duv hev rêz kirin.

-Cenabê Paşê îro nikarê we bibîne, karê wî derket, got sibe, bila sibe werin.

Yawer çawa bibe hat, bibe vejeriya. Me bi diljeniyê pejmürdeyi li hev nêrî û meşmirî ber bi xanê çûn. Dilê me hin xweş bû, hin nexweş bû, em ji serma seqemî xelas bûn û Cenabê Paşê soz da ku sibe me bibîne. Heya em gihane xanê kittên ji yeki ji me nehat. Wilo qutebir, di nava sikakên Suka Şewitî de me anîşk û dikan li xwe badan û ber bi xanê çûn. Ji kar keti, di nava keşkûliya xemgînî, di nava dilsotiya bêzarî de, devê me né digeriya. Sermayê zimanê me kiribû dar, di şikefta devê me de qersifî mabû. Axaftin ji me çênedibû. Dilşikestî, di nava quflanê de, bê hiş û raman. Xanevan ber bi me beziya. Tişte ji devi min derket: 'Gidî agirekî me bike, agirekî xurt.' Xanevan nemerdî nekir, sobe sincirand. Sobeya di salona xanê de liqasî bejna zilamekî dirêj û liqasî urben- dekê barkêşê Mêrdinê fereh dihat. Mina kûwarekê li nivê lîwanê bilind dibû. Tejî darên telîşî kir û agir gurrî kir. Himmiha û gume- gum ji sobê hat. Bû lem- lema agir. Sobe sincirî... Hindur û derveyê sobê bû yek. Mina perengekî sor!.. Li ber sobê nivî ji me xummi- han. Lê Xanevanê ciwamêr çayê li ser çayê bi me ve gihand. Pişti çay, şorbeke germ anî, her yeki ji me zerikek da destên me û nisk berdayê. Hinavên me germ bûn. Çawa germê da me xewê avête ser çavên me, em teva, li wir, li ber sobê xilmaş bûn.

Xanevan milê min hejand û got:

-Axayê hêja odên wê ji germ in, biçin xwe li ser cihên xwe dirêj bi' in. Hunê aram bibin.

Gotina wî bû, em rabûn. Çawa ez ketim odê, min qista pacê kir. Di nava hêviyeke şikestî de, rahişte perda li ber pacê û ber bi milê çepê kişand. Wilo hêdîka, bo efsûn xeranebe, ferîştehên efsûnê nerevin û dengê keçika dîlzar û neyzanê dilşikestî bikim. Min dil di 'bezma meyxur' hebû.

Cîhanek ku dibin lingên efsûnbazan de şikestî...

Cîhanek ku di nava efsaneyên ku mirovanî li çarmixê dane de winda bûyî...

Ku hêvî şikestin, pê de...

Gelo, pêpelûka hêviyan dimîne di destên kê de?

Bi dilekî şikestî, westiyayî çûme ser livîna xwe. Xanevan çarşei guhertibûn. Rastî kêfa min ji xizmet û dilovaniya Xanevan, ji guhdan û paqijîya wî re dihat. Hewqas kes, hewqas rêwingî, bi dilekî xweş û malevaniyeke ciwamêrî bi rê dikirin, nayê wesifdan. Axur û tewle, ji cihê razanê cuda bûn. Karkerên ku li axur û tewlan dinêrîn, qet ne dihatin jor, li nava mêvanan ne digeriyan. Karkerên ku hewş dimiştin û axur di miştin, her dem miqate bûn, ne dihiştin ku rîxek, tayek geya û mistek ka li erdê bimîne. Qerwaş û cêriyên aliyê jinan cuda bûn. Karker ne gelek bûn, lê hedanî ne dikete canê wan.

U Xanevanê dilovan, karek dikir, karek dikir, nayê gotin, nayê wesifdan; şev û roj dikire yek.

Her du xanên Midyadê, Xana Jêr, Xana Jor, di nava çavdariya dîroka kevnare de rizî, xeremalî dihatin bîra min. Malevaniya rêbûwariya riya hevrîşim, bi karwanên mezin re, parezgerên serpûşî re dihatin, şev û roj diman; bazara tekyana xwe,

Danûstandina malên xwe dikirin; êvaran li destanên dirêj û newirandina hozanan guhdarî dikirin. Sibehî çand, şaristaniya kevnare bar dikirin diçûn. Ew keşkûliya ji hev de bedidî, ji hev de ketî, perpitî hate bîra min. Piştî ku Xana Jorî navê xwe guhert, bû Xana Hesso, bêhn û sifta genî bi ser bajêr ket. Celalê Isa, karmendê şariyariya Midyadê, bi ceza û gotinên çiyarkirinê westiya xêr nekir. Xana jêr, kete destê Sado yê Süryanî... Ne xerab bû, lê hemberî xana vî ciwamêrî lûlik ne dikirin. Wêran bû. Xasan Hesên Paşa, li ber her du xanê Midyadê hotêla pêne stêrik bû.

Em hewqasî westiya bûn û sermayê em tengijandibûn, xew, giraniya dil, kirasê neçariya bêkesiya ku me bi destên xwe li xwe kiribû li me giran bû, sibehî em şiyar nebûn, dema limêjê hat û em di xew de... Xwedê li xêra me bû ku Sofikê Kewa li wir jî amade bû. Xwedê jê raziye Sofikê Kewa, li ber 'qutbên terîgê' parivê nanê tifikirî, şekirê tifikirî û li ser hatî xwendin, 'usimd mar û dupişkên pêvedanê; êş, elem, kul û derdan digêrine, xêra bi sed xêrî dike. Xêra bi sed xêrî... Ew baş bû ku sofikê rih bost bi berbangê re destên xwe kire kerrika guhên xwe û dest bi qesîdan kir. Sofiyekî ku êş û bela li qirikê neketî, xopano dengê wî mîna sengilê Mereşî, çingenî jê dihat. Da qîra!.. Bi dengê Soft re em hilçenîn. Min di devê derî re nêrî ku ez çî binêrim; Sofî li kêleka jobê filika limêjê danîbû û çarmêrkî li ser duv y a din pêdixist. Yek li duv y a din... Di dawîya qesîdeyên xwe de ditewirand. Di destpêkê de dinewirand û qîr didan. Xana Hesên Paşa ku xanevan hewqasî di ber rêwingiyan de dibeziya, serê sibehî Sofikê Kew. bi qîre, rêwingiyan dilsotî bike... Rastî ne baş bû, ku min dît xanevan di ber dengê soft re ketiye zikir, xwe dihejîne min fam kir ku ew jî dilsozekî Xwedê ye, di riya terîqê de bi mikewnî dimeşe. Her acara ku digot 'Medet şêzê terîqê,

medet ya resullellah' devê wî bostekê ji hev diçû. Zimankê wî yê biçûk xuya dikir.

; ferîştehân wî amade ne. Weke kabekî bû, hûrik... Bi ser hev de kûtayî, risasî... Di rê de diherikî, ji dur ve, kesên lê dinêrîn, digotin ev mirov nameşe, diherike, lingên wî mîn ateyçikên çûkê Beytik, ha ha, ha ha dibivîn. Ya xaliqê erd û ezman, çi canlidar, çi canlidar hene li ser rûwê erdê... Ya xaliqo!.. Ku biharî dest pê kir, Sofîkê Kewa ji Hevêrînê derdiket û qista Mizîzexê, cem kêrkerên ku demsala zivistanî seranser kêrên biçûk

î kalan reş, çar parsû û kalan zer î neqîşandî, yan jî şîlf zîfîkirî û kalani yên mezin, das û xencer çêdikirin dikir. Her serê biharî xuya dikir, kêr dikirîn. Bi rojaava û rojhilat re kiribû toi, li kevîka banê Qesrê rûdinişt û dengê xwe berdida. Her dem mêvanê Hecî Heznî bû. Benê peşîya mala Hecî Heznî bi lîwana zeamnî ve ku kevana dergehê wê seranser bi sihûyek kevirê şekirî, yên yekanê hatibûne hûnandin û girêdayî bû, ber bi tingê Qesrê, raserî Mala Nametî Şehîn û Usayê Miqşî yê Zazî û Çala Mala tetêr ku her sal li ser co wê tevgereke girseyî çêdibû, Silêmanê Teter î korîşkî û Emer êrîş dikirin hev, dirêj dibû, mîna zengilê Mere: diliat û diqîriya. Zimmên bi gund dixist.

Dengê wî û banga Tunamyê zazî yê gavan, dengê Şexoye Şehîn ku digot: 'Xwezî ez di de demsalên biharî de bûbane kerekî nêr' û horohora conegayên salê ku li dûv çêlekên hatine ga, nagonên nûgî-hayî diketin, tevlî hev dibû. Bi sehriya sibehî re, ew dengê mîna zengilê Mereşî, bê kul û merez pêl didane xwe û di valahiya asû-manê gundê boş î mezin de bela dibû.

Sofîkê Kewa bi dilekî safî û têr ayînî digot:

-Medet ya xewsê terîqê, ya hebîbê xwedê...

Tumayê Zazî bi dilekî westiyayî û binbar digot: -Garan çû dewarên xwe "erdin...

Şaxê di nava kasûliyeke bê karî de digot:

-Maleve Sînemê çima tu dewarê xwe nabê garanê?

Di jiyana Şexo temamî de dewar li devê deriyê wî peyda nebûye. Ji bo yariyên xwe bi Sînema jina xwe bike her roja xwedê, bi dengê Tumayê Zazî re, li ser banê devê deriyê qesra xwe, bi dengê bilind dihoriya...

Gundekî boş, Sofîkê Kewa, zar û zêç, ga û conega, karik û berxik, hawara xwedê...

Bi lez û bez me li devê dergehê xanê da û qista cihê xwe kir.

Berdestîkên aşxanan ku tepsiyên sergirtî di destên wan de, ber bi dikan û qahwexanan dibezîyan û bi dengê zîr, wirîqênî diqîriyan:

-Şorbecîîî!.. Şorbecî haaaattt!..

-Şorbeeee!.. Şorbeşîîîr!.. Şorbeeee!..

-Şorbenîîîsk!.. Şorbegermm!.. Şorbeeee!..

Bi hawarî em ketin hewşa Mizgeftê, bi hawarî me destlimêj girt, bi hawarî serê xwe danî hilanî, weke Emerê Xeco digot, bi hawarî çend poş li erdê dan û ber bi devê Sara Walî bezîyan.

Mîna berê, li cihê doh em ketin rêzê. Komên xelkê, didu didu, sisê sisê, çar çar, wilo pîpikandî dihatin bê cewibandin diketin hindurwê sarayê, bi saetan diman, car din bi wê şeqlawê û temtêla têr kubkubandin derdiketin, diçûn. Keser dihatin li me dinêrîn, bi awireke seyr dîq dikirin, lêvên xwe dişikandin. Min bi xwe pêça xwe neda kesî. Ew paçazadeyên ku xwe li serê me dikirin semyan û mala me teva wêran kirin, niha li cem Cenabê Paşâ ne, ku rahêjin hêka zêrîn. Tacîdarên Kurdan ku serkêçiya serîhildanan dikirin teva, Şax Seîd, Seyit Riza, Bavê Tujo, Sadun Beg, Ihsan Nun, Haco, teva bi van

paşazadeyan, Elîk ne di nav de, teva bi paşazadeyen xapînok, hatin xapandin. Mala gundiyan, mala xizanan, bêçaran wêran kirin. Heya dûvikê maqil'.è . 'isincirî digotin û dibelandin. Belavok bela dikirin, xwê diavêtin nava agir. Li sînga xwe didan, digotin rabin, digotin em 'i pişta^ve ne, rabin em amade ne, pere ji me, çek ji me, sazûmanî ji me, plansazî, kewna civakê li me. Ku fişek teqiya, duvikê meqilkê sincirî, kesî ew li meydanê ne didîtin. Winda dibûn. Deh caran Haco bi devê xwe ji min re digot, paşa û eşraf hene, teva bi me re ne, rêzaniya me dikin, piştgiriya me dikin, xwe ji refê hemwelatîyên xwe, xwe ji refê pismamên xwe qut neke. Em ne tenê ne, paşa ne, rewşenbîr in, zana ne, wê semyantî ê rêzaniya me bikin. Hiseynê hemnavê min, ku bavê min digot: 'Qarîşa reş destên xwe kiriye pêşîra min, bêhn li min çikandiye ji min re digot... Bi zimanekî dilsoz ji min re digot: 'Hiseyno, dev ji riya gîditiyê berbide, paşazadeyin Mérdînê, paşazadeyin Amedê, eşraf û gir-girekên.wan di nava me de ne, xwe ji me qut neke. Bi rêça bavê xwe de meçe. Wî li gorî hiş û zanebûna xwe dikir, belki, belki hoy û mercin wî wiha bûn, Elik jê biçûktir bû biya wî nekir. Elik sert bû, her duwan doza kursî dikir, ne diketin kirasên hev, axir ji bûwara hev ketin, ku bavê te ew rê, ew riya kirêt da ber xwe. Tu dizanê ku sud ji riya bi tenê, riya bi dijmin re ne dît û bi deste dewleta ku piştgiriya wê dikir hate kuştin. Tu destin qatilin bavê xwe ne gire, wisa neke.' Wî rehmetî digot paşazade. Wekî din her kesî digote wan paşa. Lêbelê, ji xwedê bawer bike, yek rojê bi tenê ewletiya min bi wan, bi paşa, bi tuxmê wan, paşazadeyan nehat. Ev kurkurîkên ku di dibistanên dewletê de bi terfî û bi nanê Al-î Osman mezin bûne, weke Sadun Beg digot; dil kurmî bûne û ketine bin tunê dewletê, nikarin bi saxlemî kar bikin. Roja li wan teng dibû, wê berê xwe ji te

biguherin, biçin devê dergehê dewletê pata xwe bidin, poşmaniya xwe bînin ziman. Nîvî ji wan sîxur in, mirov dixapînin, ji rê derdix- in û piştire bi mirov dikenin. Yê ku li ber lingan diçin em in, dîsa em gundiye reben, bêzar in. Dawî, HacAu Hiseynê me ku xwe ji refê pismam û refê hemwelatîyên xwe qut nekirin li ber lingan çûn. Kulê wan di korê wan re derket... Mala wan di meletoyê ve derket, lê paşa û paşazadeyên wan li devê dergehê 'Al-î Osman' in. Ez jî bi wan re. Lê ew, ji min jî jêhatî tirin, eu ez li gastîna derve me, li ber sermayê me, bi bizavtina bayê cûzanî re peleguhên min şewt ji wan diçe, ew serbest dikevî hindur, li ber soba germ rûdinin, çay qahwê vedix- un, karê xwe didine meşandin û derdikevin diçin. Ew ji min jêhatî tirin. Yê ku tiving da milên xwe, çete çêkirin, şer kir, li serê çiyar û deşt û newalan, li nizar û geliyan geriya, dijî serhildanan kom û 'nefiram' rakirin, birîndar bû ez bûm, ew, car din li mala xwe bûn, li ber kaba jinên xwe dîlok û leylan digotin, qehwe û çay vedixwarin, niha ez li der im, ew li hinduru ne. Cenabê Paşâ ziyaret dîkin û diçine ber soba xwe, bi xanimên newq şivik re morîkan darvedikin.

Ez li ber seqemê, bi diranên lerizandî nokan dişikînim, dilê qeşa girtî dişeqînim, qabokan difizînim, qeraman dişikînim...

Wê rojê jî, rawestandina me û serma ku me xwarî, mîna roja pûşî beletewş çû. Ber êvarî, fermandarê yawer î ciwanik, di pêpelûkên Sarayê re xwe berda û hat.

Hemberî min rawestiya, pête da û got:

-Iro karê cenabê Paşê derket, got sibe bila bîn ezê wan bibî

Mêriko, mîna min dîsa xwe ezber kiribû. Bi yek xum li yek xurrêne di pêpelûkan re hewa ket çû.

Dengê dilê me teva fetisî.



&

## ŞEVÊN BEXÎL

Şeva sêyemîn ne mîna şeven bûrî bû.

Ew du roj bûn ku serma cûzanî, seqamê di nava laşê me de hêlî- na xwe çêkiribû, cihikên têr strî û derzên têr tevzînokên qolincî vekiribûn, diliviya. Du roj, li ber serma seqema Amedê, li gastînka di nava çar zaboqên xwarûpêçkî de, ku ba di navbera sikakên teng de li hev dihate badan û bi ser me de pêl didane xwe, bi bagerêneka kofendîlî em dipêçan. Weke quredaran li me hat û Cenabê Paşê pêça xwe neda me, em dil zelîl, mûr şikestî kirin. Ne hindikî,

J\*

Kulmîro di nava hinavên me de, li kul û keserên me der bûbûn. Kêstekên axa dilê me rakirbûn û mîrowên sorîşkî, ji kulmîrowê derbûbûn, di nava hevûdûn de dixerbilîn ha ha diçûn û dihatin. Gêrik, marmarotk û gumgumokên têhn birehayî di nava laşên me de bi çirrê dileyistin. Xwerhek kete laşû me ku ji keçelî û birzikên Hikoyê Mala Sadiqê Xelef bêhtir xwerhê em belengaz û bê taqet û derman kirin.

Y a azinellah !.. Ya azinellah !..

Lîvinê em qebûl ne dikirin û kursîkê biçûk ku bi qarîçên dolabên trimbêlan hatibûne şidandin, li lîwana xanê rêzkerî bûn, em qebûl ne dikirin. Em derdiketin salona Xanê, çend ciwamêr her dem rûniştîbûn, li ser karûbarê xwe, tevgera cîhanê diaxivîn, me jî li xwe ne didanî ku hemberî wan, di nava bêmicaliyê de nîşan bidin, riya me li wir jî nebû. Bi destên xwe, ku tu pêdivî pê nebû xwe bikin ve kevaneyî hatibû ava kirin. Çar lingên kevanî ber bi çar anîşkân odê de dirêj kiribûn û kevirê xitmê danîbûn. Cih ciha şopa tevnepîrka ku di nava gemarê de reng guhertibû xuya bikira jî, Xana Hesên

Paşa paqij bû. Nêzîkî sê bazarên navdar ku her sê bajar rêbûwariya bi cîganê re dikir bû, xelkê qista wê dikir. Sê rojan, li ser hev nofek diçû didu dihatin, rê têde nedima, ji rêwingiyan li dev pîpikandî.

Çawa ketim hinduru bi dilekî têr hêvî ber bi pacê beziyam. Remo çav bi min de zur kirin. Remoyê tîtlewêskî ku goştê ser hestiyên skeletên wî teva çar kîlo nebûn, dibin seqem serma Amedê de dilerizî, çawa kete nava livînan, germa soba himandî dayê, ne bi tuwî xire-xir pê ket, weke ku tişteke nebûye kete xe»va çêrîn.

Ez di nava hêviyên şikestî de çûm û hatim.

Li ber pacê demeke dirêj rawesî v' m. Bi çavên zûr î rêr banga hawarî li paceya avahiya hember dinêrî, awirên min î di nava bêhêvitiyê de şikestî û qersifî bûn, bi ser dara bi tenê de pêl didane xwe.. Hêvî winda, evîn girtî, dil kilît kirî... Keçik, Neyzan, Zembilfiroş di nava reş-tariyê de bêzar... Reşê girtibû ser her tiştî.

Hêvî di nava reştariya li hev pêçayî û giran de hatibû pêçan.

Mala bê semyanê bê kar, wargehê bê war... Hewşa bê hej û dar, tenûra bê ardu û ar, mala bê keç û war...

Ev dilê min bû.

Dara bi tenê, di nava xewre bezê xwe de şariyare şevâ bû.

Ez bi tenê, bê dost û yar... Ez û ez!..

Derengî şevi, giraniya xemgîniyê ez pêçam, bi tenê şipê, ez û ez bûm; peşî mirovê pîpikandî serê xwe di pacê re dirêj kir, çavên xwe beloq kirin, demeke baş li min nêrî, çavên wî li hevûdin zîvirîn, zîvirîn û ji rekiha pêçavên wî zeriqîn, kenîya, kenîya, ha kenîya, tişteke ne got, winda bû. Tişteke ne got. Piştîre marê reş ku ji piştî kevirê reş derket û rabû li ser tirriya xwe zîq rawestiya, di nava kirasekî bi xwînê gemarî bûbû, serê xwe di pacê re dirêj kir, fişşan pê ket, zimanê zulfîqarî dirêj bû, xwîn niqutî, taqê odê yê hember

alîst û kişand. Ez veciniqîm, min da xwe ku ez rabim, taqet neb giraniyeke bê qedar li ser bedena min rûnişt. Dilopên xwînê bi ser min de weşyan. Min dêhnê xwe da pacê, girtîbû, lê serê mar ber bi min dirêj dibû, dikeniya, her du kûlabên diranên wî, tujik dibûn, ji devê wî yê çirrandî dirêj dibûn, hat û hat di ser serê min re, mîna deydîka hêlana zarokan çu vî rexî, hate rexê din, her ßSfa ku diçe û tê zimanê wî yê zulfîqarî rûdêna min dialîse û ez, ez di nava gevzînoka bê derman de, ha ha ber xwe didim. Bang dikim, li Remo dikime hawar, xêr nake. Xirrêna qirika Remo tê min, ez dengê fiş-fişa pozê wî dikim, ew dengê min nalra. Di geliyekî kûr de, zerzemînî de me, xaliqellah bi tenê, ne kes û ne kûs. Ne dengê min derdikeve, ne dikarim xwe bi cewciqînim. Cara dawî Marê Reş dest bi ken kir. Kenekî hesenî ku tiqtiqa wî li erçê hefta radiwestiya. Di nava xewn û xeyalên şevâ de bela bû û vekîşiya. Heya ji pacê der-ket vîqasî keniya, li derve jî dengê tiqtiqa wî dihat.

Çawa mar ji pacê vekîşiya, ez qamekê ji ser livîna xwe hewake-tim, li ser kelefên quna xwe rûniştim. Xwehdaneke sar ez girtibûm. Ji serê teliyên lingên min heyra bi mitika serê min, hinduru derve di nava lerizandineke bê mefer de. Tayên bizdonekî ez pêçam, bînaya min tenik bû. Min destên xwe avête rûwê xwe, şilahiyeke mîna demûşâ bi kefa mista min ve zeliqî. Bi zac min xwe avête derve û di nava lerizandineke şelişî, bêhn birehayî, tirsonek de qista bîra avê kir. Dêwla lastîka dolabî tejî av, li ser xerzê devê bîrê bû. Aveke sar ku parçê qeşayâ di nav de dileyistin. Min her du destên xwe kirin kovik û ha ha, ha ha li ruwê xwe kir. Ne carekê ne diduwan, ne çaran... Ha ha, ha ha!.. Bê rawestandî... Heya terk kete hinarkên rûwê min, destên min hew av girtin, ha ha, ha ha min av li ruwê xwe kir.

Ez bi dengê Remo re rawestiyam.

-Xwedê xêr bike Hiseyno, vê sermayê tu ava sar î qeşayî li nav ser û çavên xwe dike? Tê nexweş bikevê.

Min bi dilekî şikestî:

-Deng meke û ne pirse... Dengê xwe neke, bila kes, hevalên dengê te nekin. Xewnên têr kabûsî ku ji êvara xwedê ve li ser min rûniştine, ji mirinê xerabtir li min hatiye.

Gotinên di nava xeftanê hêviyeke şikestî de dihatin ser zimanê min, di şikefta devê min de gurover dibûn, li hev dihatin pêçan û dipêkîn.

Remo di ber dilê min re çû, hat:

-Xwedê kur hiştî, te cihê xwe guhertiye, ku mirov cihê xwe diguhere, xew diherime, xewnên xerab û giran têne pêsiya mirov. Tu ne zarokî... Semaxê bide xwe... Xewn in ev, ne tişteki din.

Min dengê xwe nekir. Rebenê xwedê, dixwest dilê min xweş bike. Lê kifş bû ku wî jî ji gotinên xwe bawer ne dikir û mîna min di nava şeva bexîl de gevizî bû. Em her du tene tene çûne lîwanê.

Li devê deriyê lîwanê, dengê hat, mîna ku navê min bêjin, ez li xwe zîvirim, min li hewşa fereh ku hawîrdorên wê bi stûnên qalin û bilind dagirtî bûn nêrî, tişteki xuya nekir. 'Hiseyno, Hiseynooo! Kes nebû. Min berê xwe guhert careke din aynî dengî sê caran navê min bang kir. 'Hiseyno, Hiseyno, Hiseyno!..' Dengê jina ser laşê sê mîrên Mala Kêlo di guhên min de kirin çingênî. Min careke din li hewşa xanê nêrî. Ew stûnên qalin û bilind, mîna ribanekên darîstanên Sinsila Elînê li hevûdin qeliptin, ketin û rabûn, siheke tarî bi ser wan de girt û pêl dane xwe, hewa ketin, mîna mirdiyaqên bê tirşe li nav ser û guhên hevûdin ketin.

Remo bi çavên nêçar li min dinêre.

Mefera min ma ku ez, bi dengekî bilind: ‘Yasîn wel Qur’an-el hekîm’ bixwînim.

Devê Remo ma ji hev, hew gotin jê çêbû; çavên wê yên mezin î bi kabik, ku ji bê xewî terîfîbûn, yekcara xwedê fereh û beloqî bûbûn, li min mabû xar. Deng bike, neke nizanîbû. Di nava bême- caliyek nezanî de diçû dihat. Geh li min, geh lim dora me dinêrî. Tivêla rûwê ketibû rengkî din, xarikên çavên wî ji kortika aniya wî derketibûn. Ew Remoyê bi salan çarenûsiya min û bûbû yek, qale- ma çarenûsiyê ji bo min û wî yek xêzik reşbelek kiribû, yek rojê bi tenê nekete nava bêçariyê, çûbû, yekî din hatibû. Wilo kete dilê min ku ew ne Remo ye.

Ji bo xwe bidim bawer kirin min bang kir:

-Remo!.. Remo tu li vir î?

Remo yekcara xwedê şiliha.

Bi dengekî melûl û tirsonek.

-Erê ezim Hiseyno, tu tişteki dixwaze?

Min nêrî ku guman jê re çêdibin.

-Na, na tişteki naxwazim. Em biçin Remo bi çengê min girt û hêdika hejan -Hiseyno, Hiseyno te xêr e.VT şiyar nebûye? Te xêr e gidî, sehwe tu girtî, Malkavawo tu reşkê şevê, tu serkêşê nijdevan û çeteyan bûyî, tu şêrgel û cengawerê rojê qewamê, rêzan û serekçeteyê dewletê bûyî, te hesabê komên eşîran ne dikir, çi bi te hat? Berxwe bide, xewneke têbayî te bike nava bêçarayiyekê şerme Hiseyno. Malikavawolf.

Min dev ji ‘Yasîn Wel Qu’an-el kerîm’ berda, dest bi ‘Ayat-el Kursî’ kir. Lê min dengê xwe birrî. Dengê Remo û hejandina wî ez hinekî şiyar kirim.

Xanevanê ku şev û roj diber mêvanan re diket û radibû, ber bi me bezi\

zêde dagire'. Xanevan nemerdî nekir, heya bi devê berdaxê qahwe dagirt. Gumgumê ku şev û roj di nava perengên menqalê de runiştî bû, ava qehwê çikandibû û mirdika qehwê teva helandibû, wilo tîr û tameke zilindarî xweş, ku tam û bêhna berûwê jî di nav de dihat, stana zimanê min û qeraxên şikefta devê min gez dikir, hinavên min çiqçiqand, ez jî hin bi hin dihatim hişê xwe. Rastî qehwa Xanevan xweş bû. Ne tenê bi xêl'ê stewihandibû, nişûka berûwa tal, ku li ber hinkahiya şevên Havînê hişk bûyî, di nava qahwê de hêra bû, tameke ku li ser zimanê mirov radiwesta û şikeftên devê mirov dimerastin dida.

Piştî ku hatim hişê xwe min bi awirên şikestî li Remo nêrî.

Min û Remo gelek di ber hevûdin de kiribû. Dizê yek qulê û mêrxasê yek dozê bûn. Ya rastî, di rojên giran de me destên hevûdin berneda, me ji duv hevûdin neda paş. Eger ji mecbûrî, eger ji pêdivî be, berê me ketibû yek rê, di nava xewre bezê yek çarenûsiyê de, me mil dabû hev. Wî jî bi awireke şikestî li min nêrî, ne min deng kir ne wî. ♦ |

Menqelege şeş lingî, mezin, tejî perengên telîşan bû, em jî li ber, di nava bêdengiyê birîndarî de, dilehayî... Dilê me her du hevalên roja qewamê mîna perengên di menqelê de sor, diçiqçiqîn. Gumgumekî liqasî kedûnekî Behwarî, di nivê menqalê de rûniştî bû. Heya berbangê, me li perengan, li çirîskên bi ser gumgum de dihêrivtin nêrî, perengan çavên sorgeverî bi ser me de zûr dikirin. Gotinên bavê Muşâl di serê min de, mîna çakûç û mezreban ha ha li hev diketin. Dengê topên roja gonê ku Taxa Qesrê bi ser hevûdin de kirin hêrik û şikâr... Qeqeba Kewê derengmayî... Xwîn û mirin!..

U goştê mirovan, parçe parçe, li gastînan ku kûçikan newêrabû ji bêhn û bixara barûda fetsînokî bête ser... Kulih dimirin. Mâşan hingiv di kuwarkên Mala Mihemedê Koçerê de fetisîn, bê dunde û bê mîrate çûn. Kî dikare ji ber mirinê baz bide, kî bi baz- danê ji ber mirinê xelas dibe, kî? Ê ez li lîwana Xana Hesên Paşa, li ber menqela tejî perengên telîşî, di nava sehwa firaza xwe de dilerizim.

Min fikir û ne fikir ji bira min ne diçû.

Wilo bêdeng... Ez ketibûme halweta heshesokî..

Di nava kirasekî bêkesî û poşmaniyâ de, dilehayî, pûnijî. Em du jî di nava xwe de dikeliyan.

Kemal e Kemal e... Kemal bavê me ye...

Em ketibûne nava şîn û girî.

Roja sêyem, bi dilekî şikestî û qerem şikestî, car din, bi berbangê re, li duv hev, bi rêzê em çûne gastînkî devê Sara Walî, di nava bêtaqetiyeke westiyayî de rawestiyan. Berê jî ku mirov derdiketin dîwana mîr û mîrekan, di cihê rêzê de rawestandî hebû. Lewra li me zor ne dihat. Rawestandîna me ya roja sêyem, ji her du rojên din ne cudatir derbas bû. Serma seqemî û cûzanî, dilşikestîna me û bêzariya ku me ji sermayê didît, em bêzar û perîşan dikirin. Lêbelê piştî nîvro derdorê esra teng xortê yawer ber bi me beziya û hat.

Bi dengekî bilind got:

-Cenabê Paçê wê bête cem we.

Em geş bûn, germekê em pêçan, hêviyên dilê me pişkivîn û me xwe da hev.

Erêêê erê birazî.

Ez ketim nava heyra ezbera xwe ku devê min li hev ne xerbile. Du-sê caran bi lez û bez, di dilê xwe de, wilo bêdeng min dersa xwe

dubare-sêbare kir. Lêvên min î sar ku ra û tarîşkên xwînê teva hişk bûbûn, carinan biya min ne dikirin, li hev diketin. Car din îdare bû. Ew sê roj bûn kurê 'Ezîz Çelebî Axa Hazretleri li bendeyi Cenabê Paşê bû, ku bangî wî hinduru bike, li kêleka xwe bide runandin, qehweyekê, çayekê bifermoyî wî bike, li hal û ehwalê wî bipirse, li rewşa berşan û êşîrên wî bipirse, hinek şîretan lê bike û fermanê bidê walî û derdorên xwe, ku ez kurê 'Ezîz Çelebî Axa Hazretleri me û hay ji min hebin. Bêje, Hiseyn kurê dostê min 'Ezîz Çelebî Axa Haretlerî' ye, kurê dewletê ye, xisp li stuwê meye ku em kurê dewletê bi parêzin. Gelek, erê gelek kerdên wî di stuwê me Îttîhadiyan de hene. Ev dewlet bi saya mirovên wiha hatiye ava kirin. Erê, me plan çêdikirin, sazûmanî amade dikirin, lêbelê wan çekdariya me dikirin, cengaweriya me dikirin, parêzvanên dewletê bûn. Dijî pis û pismamên xwe, dijî xayînên dewletê sînga xwe dane ber beran, xwîna wan jî mîna me di ber dewleta Tirkiyê de rijiyaye. Ev dewlet, Komara Tirkiyê çiqasî ya me be, ya wan e jî. Emanet û qiyamet... Emanet... Emanetê wî...

Cenabê Paşê wê bê cem we, ne emê biçin balê. Hema wilo li ser piyan!.. Seyr e!.. Belkî!.. Kî dizane, kî dizane, belkî me vexwendî ser sifra xwe bike!.. Gelo fermandarê pêşî ez pê nedame nas kirin, gelo xortê yawer ew pateya ku min jê re da û min kunya xwe jê re xwend, di guhên wî de ne xwend. Ne xem e!.. Ne xem e!.. Ez bi xwe !.. Baş e !.. Baş e, ez bi xwe, ezê bi xwe kunya xwe jê re bixwîn- im û xwe pê bidim nas kirin. Em binêrin bê Cenabê Paşê çawa, wê çawa bikevê çengê kurê 'Ezîz Çelebî Axa Hazretlerf û li darî paşa û paşazadeyân pîpikandî bi xwe re bibe, destên xwe li piştta min bide. Tirkênî li dilê min ketibû, lê ez hatibûme wir û yazdeh gîrgîrekên ku li ser navika xwe dibirîn bi min re bûn. Ne dîtî veger şermezariyeke



kirêt bû. Hetîketî ji wê mezintir çênedibû. Em dê çi bêjin xelkê û çi bersivê bidin. Na xwe, wê kêlikê ya vegeerê bû. A niha di wê demê de...

Hah me dît Cenabê Paşê di devê deriyê Qonaxa Walî re da der. Hat û hat li ser sefika pêpelûka raser rawestiya û li me nêrî. Qapûtê wî li ser milên wî bû, çengê xwe di zendikan re nekişandibûn. Walî, paşa û paşazade li div bûn, li lept û livandina wî miqate bûn, li dev û çavên wî dinêrîn, ku wê çi bêje, çi bixwaze. Li ser pêpelûka jorî rawestiya û bi her du destên xwe guhikên qapûtê xwe girt, ber bi qemçika xwe kişand. Qapût li nav milê wî rûnişt. Tene tene xwe di pêpelûkan re berda, awira wî ne şikandî li me ye.

Ez, ha ha, ha ha dersa xwe ezber dixwînim. Berî ku bigihê cem me bi du gavan min bi zac paniyên pêlava xwe li hev dan û destê xwe yê rastê bire pêçavê xwe, bi rapêniyeke eskerî pête jê re da. Bi dengê birêzî û dilgermî min dest bi xwendina kunya xwe kir.

-Ez Hiseyn Axa, kurê 'Ezîz Çelebî Axa Hazretleri' me, serekçeteyê dewletê yê Tora Hevêriya... Bendewarê dewletê... Min di serîhildana Bagokê de, hem berî Haco û bîstûçar eşîrên Tora Hevêriya, destên xwe da destên dewletê û kulê pis û pismamên xwe di korê wan ve derxist. Min yek bi yek qesir û qonaxên wan wêran kirin ku yek ji wan venegerê Tora Hevêriya û li serê dewletê nebin bela. Me dijberên dewletê weke çêlikewan berdest kirin, yê ku me kuştin yê ku me dane destên dewletê. Ez û piştgiren xwe axalerê dora Midyadê, ji bo dîtina Cenabê Paşayê xwe hatine vir.

Xişwaşî ne kete reşkân çavên wî û tivêla rûwê wî nehate guhartin. Mustafa Kemal şa destê xwe wilo bi sistî ber bi min dirêj kir. Çavên min li rûdêna wî bû. Tivêla rûwê wî sar û awira wî ku li nava çavên min dinêrî ne şikest û ne kudkudand, birhên wî ne liviyan, lêvên wî

ji ser hev neçûn. Çawa destê wî ber bi min dirêj bû, min destê xwe ji ser aniya xwe daxist û ber pê dirêj kir. Weke keşeyên dora me, ku serê teliyên xwe li kefa mista berşanâ, ango mirovên hemberî xwe didin; Mistefa Kemal Paşa serê teliyên xwe li kefa mista min da û kişand, bi dengekî welîkirî, ku di nava hêrsa dil de pêçayî û bê têhnik wiha gote min.

-iyi bîr bok yemîşsîn sankî.

(Weke ku te guwekî baş xwariye.)

U rê girt ber bi trimbêla xwe çû.

Heft xencerên Musa Begî di ser dile min de rûniştin.

Heft birînên bê xwîn di serdilkê min de vebûn. Devê

digeriya ku ez bêjim ay. Xwîna di nava rayên laşê min de bi yek carê zuwa bûn, spîçolka xirîqa dawî girte ser tivêla rûwê min. Xîzzêên bi zengelora min ket. Pozê min zuwa bû, hilmeke sar û zuwa di boriya pozê min re fûrî. Kêstekên bezê nava hestî û hinavên min bi yek carê heliyan. Valahiyeke giran, di nava perengên agirê menqela telîşî de diçiqçiqîn, di valahiya sebeta sînga min de rûnişt. Şikefta devê min zuwa bû, zimanê min di nava qer- fên bêçar de hişk ma.

Kabokên min lerizîn, lêvên min ku ji serina cûzanî rewa di wan de nemabû, yekcara xwedê hişk bûn. Kela girî hat û hat û hat di zengelora min de rûnişt. Ne derket ku bêhna mun fereh bibe, ne paşde vegeriya ku bibe kûleke zelîtanî li ser kezeba min rûne. Heya trimbêla Cenabê Paşâ hereket kir û li anîşka hemberî me zîvirî, em di rêzê de bê derman û ji kar ketî mane li wir. Piştî ku Cênabê Paşâ û girgirekên pê re, li trimbêlên xwe suwar bûn û dane pey hev, kes li meydana Qonaxa Walî nema, bê gotin, di nava bédengiyêke têr şermezarî de, li duv hev, em ber bi Xana Hesên Paşa meşîyan. Car din ez li pâşîya axalerê xwe bûm, ew jî mîna rêza meydankê li duv

hevûdin, di pey min de, bêdeng, di nava şermezariyeke giran de dimeşîyan.

Pozê me hatibû firkandin.

Çawa em gihane xanê, min dengê xwe li Xanevan kir û got: 'hespên me amade hikin'. Xanevan her got, dereng e, vê êvarê hunê biçin kuderê, sibeh tê xêr pê re, me biya wî nekir. Ji xwe hevalên min bi xwe çûne tewlê û dest bi amadekariya teng û bertengên hespên xwe kirin. Çawa zînê hespên xwe li ser pişta wan şidandin rakeşî xwe kirin, derketin li nîvê hewşa xanê rawestiyan. Heya min hesabê Xanevan dayê, hespê min jî amade bû. Ez li hespê xwe suwar bûm û ber bi devê derî meşîyam. Melkemotê roja yekemîn ku dilê min dax dayî, li devê dergehê xanê bendeyî min bû.

Min nêrî ku mirovê me yê terz bajarî û pîpikandî ku roja pêşî hat û li kêleka min rûnişt, li navê min pirsî û gotinek ji devê wî demeket, li wir e. Bi awireke dijwar û têr yarî li min dinêrî. Ez ketim nava dudiliyan, ez biçim ev kurê ku ne ez nas dikim, ne min dîtîye û ne bînaye, gotinên ji xwe zêdetir bêje. Ya Xaliq^derdê me ne besî me ye, ev jî... Li vî bajarê ku serê mirovan bi pîvazekê ye, ez nikarim tiştêkî bêjim, ji welatê min jî dûr e û ez gotinên wî bikime dilê xwe, roja derba min hat ez daweriqînimê, tola heft bavan jê hilînim. Wê gotina xwe bêje û pişta xwe bidê min, biçê. Çi bêje jê re dimîne. Ezê çî bikim.

Kêlîkekê di nava dudiliyê de mam, \ê min xwe zû da hev. Ew çî bêje ji ya Cenabê Paşê ne mezintir bû. Çi dibêje, ji gotinên Cenabê Paşê mezintir nabin, dilê min birîndartir nake. Tu kerdê min di stuwê ciwamêr de nebûn. Wilo xuya dikir ku derdekî wî bi min re heye. Ji min dilbikul e. Dixwaze ku tola xwe bi gotinan hilîne. Dizane ku cihê gotinan, malkambaxtir e ji birîna xenceran. Loo çî dibêje fidî çavên

wî. Xem tu ne, çi dibêje bila bêje. Min lingên xwe bi zac li bin zikê hespê dan. Li devê dergeh, mirovê terz bajarî bi awireke tuj li nafe her du çavên min nêrî û bi zarekî tal î zilindarî wiha got:

-Te sohra xwe xwar.

Mêriko gotina xwe got, piştta xwe da me, rê girt ber bi Melîk Ehmed, Çarçiya şewitî şûtikand, çû. Ya mêrikê terz bajarî, kula dilê wî ez bûm. Hevalên min teva diber re derbas bûn, gotinek ne gote yekî ji wan, yek ji wan necewiband, heya ez gihame ber, tîr di kevande amade bû, awira xwe şikand, teliyên xwe sist kirin, tîr berda, di ser birîna dilê min de çikizand. Min xwest ya dilê wî fam bikim, çima ez, ji kuderê min nas dike, min dixwest fêr bibim. Ew jî kulek bê derman, birîneke têr şevvat bû. Wî jî, mîna Cenabê Paşe bi sê-çar gotinan agir berda dilê min, dilxun kirim, şûtikand çû. Kanîreşka dilê min di nava bêzariyê de ma. Hêka dilmê şikestibû, avşolka zelîkongî, bi demûş bi ser hinavên min de diherikî. Min devê xwe tejî kir, min hewl da ez tişteki, gotinekê, bo nas bikim, pirsekê jê bikim, çi ye, çima, kî ye, dizanibim, xêr nekir. Lêvên min sar bûn, zimanê min di şikefta devê min de qerfokî bû, qurimî, hişk bû, mêrik meda xwe stand. Pêça xwe neda min, li pişt xwe ne nêrî. Zincîreke dirêj di destê rastê de ber bi ba dikir, ha ha di hejand, li teliya ristê di pêça, car di din verîşand, car din di pêça û çû. Min çav di pey de zûr kirin...

.-Z'

HÊVIYEK ŞIKESTÎ Û

RÊWINGÎTIYA XEMGÎNÎ

Min kiras kevin kir...

Min kavil kevin kir...

Min cih û war û xwîn kevin k

Min erd û ax û hiş kevin kir...

Min hesret kevin kir birazî...

Min gotin kevin kir...

Min pirtûk kevin kir...

Min alfabe kevin kir...

Min dîrok kevin kir birazî...

Gotinên Cenabê Paşê, keskûniya me hêrivand, hêviyên me şikandin, em belqitandin. Piştî wêraniya gastînka hemberî Qesra Walî, rêbûwar li ber min û hevalên min winda bûn. Em suwarê hespan bûn, lê bayê dawîya Zivistanî û bapeşkên fimikê hespan, got-inên mîna cewherê xencera Musa Begî em ber bi çarenûsiyeke bêbext dibirin. Bedeneke termkî, ji kar ketî li ser zîne hespan, mîna werqîlên bê ben, bê werîs rûniştibûn. Mêjiyê ku di nava xewn û xeyalan de dîlana paşerojan lidar dixist, ketibû nava mij û morana zîfta zelîqonkî. Simaqa şîştî... Kizwana şikestî... Belalûkên rizî... Ba demûşî bû, gotin demûşî bûn, ezman demûşî bû, ax demûşî bû... Gotinên mêrikê terz bajarî demûşî bûn, zimanê marê piştî kevirê reş demûşî bû, gotinên Cenabê Paşê demûşî bûn... Şâqam û gotinên mêrikê Qilitî demûşî bûn... Keçika deng zêrîn demûşî bû... Dengê neya dîlzar, teliyên Neyzanê meyxûr demûşî bû... Dara bi tenê demûşî bû... Dil demûşî bû... Ba, gotin û ezmanê demûşî bi ser me de dixumiha. Riya bazdanê nebû. Reşek, reşeke bi ser hevûdin de kutayî, çil qatmanî bi ser me de girtibû. Bînayeke korîşkî, hitim, ava reş bi ser de rijihayî, herhilî mabû di destên me de.

Siha ezman ji ser me çûbû.

Korîşka dilê min, aliyek bizmarên çar parsû bû, aliyek das û qey-nax bû, aliyek reşbîniya demê. Çîrok û çîvanokên dilê min teva fer-fitîn, yek bi tene, yek ji wan sax nema bû. Lîstikek, bîranînên zarokatiyê,

hevalên min, hogirên ku ez bêyî damistom g d' cırım nava refên xwe, teva teva ji bîra min çûn. Kela şehweta mirinê ez pêçam. Taya mirinê, bi keskûniyekê êriç dikirin ser mêjyê min, hewn winda, hêvî şikestî, dil gemarî dikir. Bajarê Amedê bi ser min de, di nava waweylêyeke hawarî dixuriha. Xanî bi ser serê min de hêrivtin. Sikak teng dibûn ez diguvaştim. Dika idaran şûr û mertal kiribûne destên xwe, pêxwasên Amedê, 'ix'çiyên ku tirrê wan bûne fis teva, xiştiken wan di destên wan de, li min dihatin hev. Karik, berxik, dewarê stûr bi alên di stuwê xwe de êrîş dikirin ser min. Al, paçik, desmalên rengo rengo ku li sikak û zaboqan hatibûn dale- qandin, qîr didane min. Zarokên dibistanê, di rêzê de, ala sor î bi heyv û stêrik, ala di nava xwînê de reng vedayî, bi marş û navê ' Yaşa Mistefa Kemal PaW^Jgg' ez dipûm, ez ji wî eyarî dikirim eyarekî din. B ajar li min giran bû.



Mezin ez ber bi kûraya dilê xwe kişîşandim, bêhna min a, mefer ma ku ez xwe ji nava bajêr, bi hawarî, bi bazdan erve. Peşkên baranê hûrik hûrik dibarîne ser sûrê zilma min rûniştî.

)i nava xwe de difûriyam, hêstirên dilê min bi peşkên baranê re, hûrik hûrik diniqutîn ser birînên min. Dergûşa jiyanê di nava reşbîniya min de bilûra tenêbûnê, neya posinaniyê dilorand.

Birazî, ez bi serê bavê xwe û te bikim, heya bi navçeya xopana Çinarê, kit û telafiz li yekî ji me neket. Mêşa li ser pozê me didanî, me mecal û xîret nebû ku em kişş bikin mêşê. Te bi serê pozê me girtibane, canê me her duwazdeh suwarên ku berî bi sê rojan li ser navika xwe dibirîn, digotin em bi sed mêrî ne, wî biçe.

Gotin, gotinek bi tenê ji me çênebû.

Em ji dengê xwe ditirsiyan.

Me newêrabû dengê xwe li hespê xwe bikin.

Hespên qeremşikestî pêl dilê me dikirin, bi terpênî \_ me dikurkusanandin, di nava kesûliyeke bê nav de, li goi dimeşyan.

Her tişt dijî me bû. Her tiştî bi çavekî xeyalşikestî û mîna mêrku- jekî hêvî şikestî êrîş dikire ser me. Gotinên Cenabê Paşê di guhên me de dikirin çingênî. Keskûniya me nemabû. Mêjiyê me di qulqu- land, her sê-çar gotinên Cenabê Paşê bûbûne gêrik û kêzikên dewşgerên di nava cestê laşê me de digeriyan. Hûrik hûryk, lê bi nawîskên têr qolincî. Geh di ser dîlkê me de kom dibûn, geh di nava ra û tarîşkân xwînê de bi hêrs ji vî serê laşê me diçûne serê din. Ha ha digeriyan, ha ha, ha ha cih diguhertin. Min dixwest biqîrim, heya deng dimîn de hebû biqîrim. Jehra di nava hinavên min de li hev gihayê hev verîşim. Şewata dilê xwe bi awazeke ku cîhan teva dagirtibane daximrînim. Ya azinellah, ya azinellah şewata dilê min difûrî, bûbû bêhn û bixar, di şikefta devê min de digiha hev. Tameke tirş î jehrî ber bi devê min diherikî, difûriya. Mîna marê di tur de kuffên bi min diket. Mîna evdalê bê dar û ber li min hatibû.

Ew dilê ku bi coşî, hêrseke hêvidar lê dixist çilmisî, di nava bêdengiyeke kurmî de xeniqî. Di nava hişmenditeke kor, di nava hewnekî bê wate û bar û piştiyek pirsên bê bersiv de dihatim guvaştin. Min newêrabû li hevalên xwe binêrim. Min newerabû li peşya xwe binêrim. Min newêrabû li dora xwe binêrim. Tirseke têr şermok bûbû perda çavên min. Xwedê dizanê ku hevalên min jî newêrabûn li min binêrin. Em careke din liqasî rastiya xwe bûbûn, hê jî me ne dixwest rengê rastiye bibînin. Rastiya ku hatibû, di tivêla rûdêna me de rûniştibû. Di reşik û bîbîka çavên me de pelax bûbû, em ditirsandin. Rastiyeke hişk, zuwa û dijwar ku qet fer- ezende ne dida. Em bê çek bûbûn. Em, ji keskûniya berî sê rojan, ketibûne

nava belqitîbûneke bê derman. Mîrzayê di dilê me de belqitî, ferfitî, mir û çû. Du rê... Du dil... Reş û spî... Du rê li pêşiya me hebûn. Mîna şev û rojê ji hevûdin cûda, ji hevûdin dûr... Du rê... Reş û spî... Rastiya me her du rê derdixistin pêşiya me, em kor bûn. Mîna reş û ronahiyê, her dem, heya roja îro, me pêl rastiya xwe dikin, pêça xwe ne didayê, berê xwe ji rastiya xwe diguherîn. Ronahî li pâşiya me ye, em qîma xwe pê nayînin. Nanê kurmî bi me xweş hat û hat û hat, em ferfitandin, em belqitandin. Cenabê Paşê bi sê-çar gotinan çekên me ji destên me girtibûn, em ji mêranî xistibûn. Çarik ji me kêmbû. Çarika morîk kirî, dor gergef û ten-tene kirî... Mîna mala Pâsmalko, J>ê çawa roja gonê di nava bêxîretiyekê de ferfitîn, pâsmalk dane ber xwe, navê wan hate guhertin, ku me jî çarik dabane serê xwe, navê me wî bête guhertin.

Sala 1926 an, ku top hate ser Mizîzexê, gundiyên li piştê Hiseyn bi yek carê sef guhertin û bêbextî li Hiseyn kirin. Hiseyn û pis- mamên xwe li ber xwe dan û hemberî top û cebilxaneyên Ittîhadiyan şere xwe kirin. Şifqeta, mêrxasên roja qewamê, Beko, Hesenk, Teter, Beko û Namet bi hewara wan ve gihan. Quna Mala Pêsmalko cih negirt, tirsîyan, kozik berdan, desmala spî hejandin, hatin li kêleka min û Ittîhadiyan rûniştin. Di wê heydênîyê de pez, dewar, zarok, jin, mal, mewdan, tekyan bi yek carê di nava piyan de nan. Pez, dewar, jin, zarok, mal, mewdan, tekyan teva terqîyan. Qîrêna zarokan, lîle lîla jinan, car-bara bizin û hîrrêna hespan di nava hevûdin de winda bûbû. Keriyê pezê Hiseyn, hît, kej, mâşin di nava waweylêya bêxwedî de, ji hewşê derket, bi gastînan ket, ma bêxwedî. Ew ketibûne hewla canê xwe. Li mal û mewdan ne dipirsîn. Kî bi kê diket. Gurmên û himmêna berê topan li ser qesr û qonaxên Mala Osman rûdinişt. Berik diket, yek dihat, yekî



difiqand... Yek li pey yê din diket... Mirin diban... Goşt û parçê kevir û ax ji ezmanan dihate jêr. Keriyê pezê Hiseyn ji hewşê baz da û ber bi neqaba mala Pâşmalko reviya. Mala Pdşmalko ji koç û mal derketin peşiya talanê bê xwedî. 'Nefîram' li ser Hiseyn gihabû hev û mala Pâşmalko dizanîbûn ya Mala Osman bi heyho ketiye, du topên berazî li hemberî qesr û qonaxên wan rûnandine, ha ha bom barduman dikin. Esker ji sê hêlan ve: Hemberî gund, ji rojava rojhilatê gund ve, başûr û bakur ve dora wan pêça ye, Di; Naqorko rût î li rastê, bê dar û devi, nikarê wan bi parêze. Yan wê teva bêne kuştin, yan jî teva wê birevin, Mala Pâşmalko ji bo ku xwe bi min û qumandarê Tirk xweşik bikin ji koç û mal derketin p8şiya talanê bêxwedî. Derdorê heftê-heştê pezê neqandî li devê dergihê bi latik civandin. Mêran kêrên kalanê tuj kirin, peşmalk dane ber xwe û li ser latika devê dergehê zemanî, ew pez, yeko yeko gêr kirin, gurandin. Jinan firax anîn ku goşt bixinê. Mêran ha ha pezê ku ser jê dikirin çerm dikirin, ûr û rovî diavêtin gastîne, goşt parçe dikirin. U di nava xwe de leva dikirin. Nehîb bû...

Ji wê rojê û vir de, navê wan bûya Mala Pâşmalko.

Sê kevokên aşitiyö, baskên xwe danîne ser milên xwe, ber bi dergehê Mala Pâşmalko çûn, mêla, keşa û seyîdekî avzel î mêvan... Gotin 'ne kurra bûkê ye, hun gundiyên hev in, pismamê hev in, derfehathiyê nekin', guhdarî ne kirin, buxza reşbîniyâ ew kor kiribûn, neçar vegehiyan. Xemla rojê, xemla dil şikestî konê xwe vedabû.... Gundiyan ew derfehathî efû nekirin, nav li wan kir. Mala Pâşmalko. Ji bo çend kilo goşt xwe mirandin, ocaxa bavê xwe tefandin. Bi hezaran kesî li talanên xelkê dane, bi sedan sewalên xelkê guran-dine, kesî nav li kesî ne kiriye. Lêbelê derfetên wiha ku di qada micalkeysî û derfehathiyê de dibin, civak efû nake.

Mala Pâşmalko!..

Kes diqîriyan, ax diqîria, ezman diqîriya, av diqîriya, dar diqîriya... Zarok, zarokên şîran diqîriyan... Xwîn, goştê parçe kirî diqîriya, xizanî diqîriya... Pezê li ber kêrê diqîriya. Mal diqiriyan... Welat diqîriya...

Mala Pâşmalko!.. icar em bûn.

Çarîkek, desmalek ji me kêr bû ku em bidin serê xwe û navê xwe biguherin. Mêranî ji me reviya bû, dilpolahî ji me reviya bû, em çîz bûbûn... ÇîzL Bi sê-çar gotinan em ketibûne nava gidîtiya ter şermezari. Hêlezê dilê me ku di riava bîst salên qelenderî de katik dabû, şax û çiqliyê têr çilo dirêz kiribûn, bi yek carê hişk bûn, di nava reşbîniya Payiza çav zerik de pûç bûn, weşiyar. Xêr ne dikir û me hew dikarîbû navekî li xwe bikin.

Di jiyana xwe de dilê min bi kesî ne şewitiye. Wê kêlîkê dilê min bi min şewitî, xirîqa girî hat, di zengelora min de rûnişt û demeket. Ne çû ne hat. Çawa em ji Çinarê derbas bûn, li serê

Mitikê raserî Çinarê heya xwedê awaz dabû min, bi hêrs min dengê xwe li hesp kir û lingê xwe li bin zikê lawira kerr û lal da. Hespê reben, di nava kesûliyê westiyayê ku hajê wê ji bayê felekê nebû, di nav dudiliyê nezanî de hejiya û ji cih xwe qevast, pekî û rijîha. Piyeke rast, deşteke raxistî li ber min bû. Min bi dengê bilind, heya deng di min de hebû qîr didan û lingê xwe li bin zikê hespê didan. Lingê hespê ji erd hatin birîn, ax û zixur ji ber lingên hespê bi ser serê min ketin. Firnikên hespê fereh dibûn, firrên pê diket, dikeliya. Hevalên min şaş bûn, li hevûdin nêrîn, pîşî dengê xwe kirin: 'Ha Hiseyno, ha Hiseyno, gidî na, hay ji xwe hebe, wiha neke!..' Xêr dike êdî. Min hilanî û danî. Li hesabên wan jî hat. Wan jî dengê xwe li hespên xwe kirin, lingên xwe hejandin. Duwazdeh

suwaran di wê deşta sere sirtika Çinarê de, li dûv hev, di ber hev re, bi qîr û horhoreke têr buxz kurmê xwe diweşandin. Bilî du darên serî talanî di wê beriya fereh de, temtelus nebû. Deşteke dûr û dirêj û em duwazdeh suwariyên dilbirîndar...

Heya wê kêlîkê navbera me û hespên me fereh dibû...

Navbera me û dilê me fereh dibû...

Navbera me xwe bi xwe fereh dibû...

Bi dilekî şikestî, bi nêrîn û awireke şikestî li hevûdûn dinêrî. Navbera me û mêjiyê me fereh dibû. Sînorekî mezin ketibû navbera alavên laşê me. Xwîneke sar, mêjiyekî bê kewn... Em têgîhiçtibûn ku firaza me tejî zîwan e, tejî mij û moran e, tejî dirrih, strî, dasî û quncir e... Firazeyeke tarî, têr reşbiniya d> nava gemara nezanîne de hatibû pêçan, herhilî ji hev de ketî ku têhnika roniyê tê de peyda nabe... Nezanîn çiqasî zor e birazî...

Kesê ku firaza xwe nebîne, pêşiya xwe nabîne.

Em ketibûne dewsa Birahîmê Xerabqesrî...

-Heqê te li te nebû Bi 'hi.no. Çi heqê te li te hebû Birahîmo? Heqê te li te nebû Birahîmo. Weytî Birahîmo, weytî! Heqê te li te nebû.

Heqê te li te nebû Birahîmo...

Ez, hi. 1 û cebilxanan, bi kom û eşîran ne dihatim safî kirin. Bi sê-çar gotinan ez pûç kirim. Cenabê Paşê bi sê-çar gotinên hêdîka û bêyî teqêna tivingê ez çîz kirim. Lê, nezanîya min, ew reşbîniya min ku ez kor kiribûm tişteke ne dianî bîra min. Mistefa Kemal Paşa, ku girgirek û paşa, serkâş, mîr, zana, axa, Kurd teva, kişûmat xapandin, teliya xwe da bin quna Sowyetistanê, piştî sandoqên zêr û cebilxaneyên ji wan standin, mîna Lehdoyî Dîn bosta xwe danî ser milanoyê xwe, bê tunî cinqî wan kir, Ingiliz xapandin, Fransiz û Rusî razandin, kulê Yewnaniyan di korê wan ve derxist, mû ji nava

mastê li ber bîstûçar dewletan derxist, fika li ber xwe vekir, para xwe, hiştina xwe, li ser stana cihana gewrik rûnand. Ez li ber ejderha û dêwê demê çi bûm.

Ez Hiseyn Axa bim, kurê 'Ezîz Çelebî Axa', ku xelkê digote min 'mare di tûr de', wilo hêsanî bi çend gotinan çiz bibim. Lê ne ez, ew marê di tûr de bû, ku kesî ji me ne fişşûna wî kir, ne tê anî der, ku karê xwe qedand, bi guzeka me teve girt û jara silêmanî zerki nava laşê me kir. Marê pêvedanê, li te dizîvire û bi guzîka te ve dide. Av nagihê sêr te, av. Dilê min gelek caran hatibû guvaştin, gelek caran ez ketibûme nava tengasiyan, lê vê carê, vê carê bi çend gotinên Cenabê Paşayê ku kerdên min di stuwê wî de hebûn... Paşa marê pêvedanê bû, ez zemt kirim, bi guzeka mm veda. Piştî min li erdê da, ez çêkirim û şandime mala xwe.

Me paleyiya pûş kiribû. Palayiya pûş û qeselê...

Strihê poşmanan nayên birazî...

Gotin û galgalên min, têveger e. Vegera ber makê ye. Vegera rastiye ye. Vegera perengmayî, qeqeb û xurra Kewê derengmayî... Bê hemdî xwe, tîqe tîqe ez liqasî rastiya xwe bûm. Rastiye ez gir- tim, destên^xvK kire qirrika min, ez bemedam. Ez vedigerime rastiya xwe. Pêl xwe dikim... Pêl dilê xwe dikim... Pêl keda şermokî, pêl keda bê wate, belaş, miftbelaş çûyî dikim... Keda nezanî, reşbînî... Ku ez pêl xwe bikim, çêtire ji pêlê kirina Cenabê Paşâ... Ez kurê 'Ezîz Çelebî Axa' li cem Cenabê Paşê, paçikekî avêtinê bûm. Nepaçik ji, qepalekî ku toza li ser cama trim bêla xwe baqij kir û avêt. Edi Tora Hevêriya jê re sali ye, Berriya Xelef Axa ji... Haco, hew dikarê vegeê Bagokê û Hiseyn hew dikarê vegeê Mizîzexê... Qasimê Mistefê çiqasî li ser sînga xwe bibirê nikarê ji sînorê Midyadê derbas bibe.

Ez ji bû me tat, kewê çengo kiri, min xwe kire qepalê devê deriyê dewletê... Ez darek, quredarek bûm, ne xwendin, ne qalem, ne defter, ne pirtûk. Cenabê Paşe dikare sed mirovê mîna min ji gastîna guhê gundên Anatolîy a peyda bike. Karê min nema, karê wî bi min nema... Êdî xortên Estilî, xortên di dibîstanan de di pitik û nîv xwendî jê re pêwîst bûn, ne ez. Dema min xelas bû, rola min nema... Dem hatibû guhertin, ez di nava xewn û xeyalên rizî, zingar girtî de razayî bûm. Dawî, dawî pişkoka dilê min sotî kir, kire rijî, pêlê kir.

Ez zêde çûm, sohra min da min.

Dîrok wînda bû...

Coxrafya hatibû talan kirin... Fîzîk û kîmya tunebûn...

Matematik di nava xwînê de xeniqî ezmanan ku di nava qîr û awazên jinebiyan d«

Aha vaye destên min, vaye çengên min, 'bi ah-û medet' bi daseke kuh, bi qedûmekî dev şikestî jêkin. Raîmannalah ez dengê xwe demayêxim... Her sê qesem navê xwedê ne ku ez, weke Berhîm, bi bexîlî, bendeyî deng û awaza xwedê neminim... Ku sê caran Yezdanî Pak î dilovan bangî Berhîm kir, destên wî negerîyan, kakûlên biskên spî bi ser rûdêna kurê xwe de dihejandin, hêstir mîna baranê dibarandin, Xwedê ku dibêje min erd û ezman ava kiriye, derya û bej lidarxistine, bi zarê xwe yê sêrîn sê dangan bangî Berhîm kir. Berhîm te sozek daye!.. Berhîm te xwest min da te, te soz da, bike!.. Berhîm!.. Berhîm!.. Berhîm!.. Evdeki ser reş ku ne bavê wî kifşe, ne xalê wî, bi bangekê ez rakirime lepan, bi sê gotî- nan ez li ser kelefê qunê rûnandim. Weytî Hiseyno!.. Ez mîna çavxaniyeke avê ku di serve biçê û careke din di çavikên derdikevê re vegeêrê kûraya dilê

erdê me. Tî me, zar zuwa bû me. Kesî tu sud ji min negirt. Erdeke beyar, bê dunde. Qelaçekî bê zûrik... Ezmanekî bê hêvî...

Rast e, weke ku roja gonê dengê mêrê nenas ku bang li Mala Kêlo kir û got: 'Eskerê Roma Reş qotik e...'

Wê qotikê, îro ez qelandim, ez biraştim û bi saxî kirim gorê.

Dad û meded, ey dilê di nava xwînê de xeniqî. Ey dîlzarî, ey cengawerî, ey tacîdariya xelkê, ey padîşahiya kurê ne tikesa!.. Xemgîn in roj û hîv. Xemgîn in dil û evîn!.. Xemgînî: Ey atafiya dilwêranîL

Sê mêrên mala Kêlo, li pişta ziyareta Kêlo, berî bigihne Kevirê Bel bi pêncih metroyî ketin. Eskerê Roma Reş li kevana Bt iha Segvên cîwar bûbû, li Tarikê, li sirtika Neqebka Mala Kêlo direşandin. Ezîzê Evdê di anîşka mala Hewşiko de kab berdabû erdê, tivinga xwe dilorand. Zilamê Mala Kêlo derketin û şipê dest bi şer kirin. Kî bû nizanim, dengê xwe li wan kir, got; 'Rûnin, ev ne şerê kozikan e û kesên hemberî we jî ne xêro dêro ne, Roma Reş e... Mîna qotikê ye, bi ser ku de digire diqijilîne. Qotik e!.. Kulihê bejik e xelas nabe, digire kuderê kaf-û kûn dike. Rûnin şerê xwe bikin, ne dora mêranî û mêrxasiya pesindanê ye. Da em dikaribin tirş û talanê xwe xelas bikin. Da namus di nava piyan de ne mine.' Hê gotina wî benîademî di devê wî de, zilamê pêşî nikûbî, yê din pê ve bezî, ew jî bi ser de ket, yê sêyem bi ser wan beziya ew jî bi ser her duwan de ket. Ezîz ji cih qevist, ber bi wan beziya. Şewtek şînik li Ezîz kirin, di nava toza beran de winda bû. Her kesî got; Ezîz kirin serrad. Hew me dît, Ezîz di wî serî toz û dumana şînika eskeran re derket. şipê, şer kir û xwe gihande wan, du-sê jin, ji pişta Mala Hewşiko derketin, ber bi kuştiyan beziyan, bi kötek gihanê ser laşê wan. Nêrîn ku can berdane, jinan li xwe da, dest bi dilojarê kirin. Ezîz dengê JO«e li van

kir, bi wan de xeyidî, rabû ş ipê û ber bi gund beziya. Jin ketin bara wî û esker, ji bo ku tiving neçinê. Di şer de, Kurd berê tivinga xwe nadin jinan. Lê eskerê Roma Reş, jin, zarok û mêran ji hevûdin na bijêre. Jinan bi wê pêwanê xwe didane ber Ezîz. Heya ku yek ji wan bi sitima ve çû erdê. Ji bayê beran ber xwe nedît, li kevirekî terpilî, ket. Bi ketina xwe re qîrek da: 'Qotik li we bikevê rebbî.' Lê qotik ew bi xwe bûn. Jineke din du-sê caran nikûbî û rabû, her du destên xwe ber bi esker ve hejandin, nifir û

sixêf kirin, xwe nepandî kir. Xwedê rasen min e ku ez neweyiyan nakim. Ez li kêleka fermanarê Roma Reş rawestiya bûm û min bi çavên xwe didît, mina gur bikevê nava pezê bê şivan, bi berê topê û kulmoza berê tivingan kes û kûs tev diketin, tev dirabûn. Tertûbela dibûn, nizanîbûn bi kuderê de baz bidin. Riya bazdanê nemabû, rê winda bûn. Cîhaneke kor, bê dergeh... Lê gotinên ciwamêrê ku dengê xwe li Mala Kêlo kir, di serê min de tevkêl tevrabûn. Ya rastî min dixwest wî mirovî nas bikim. Di v qerqêşûnê de min dengê wî jî nas nekir, lê gotinên wî heyra îro, guhên min de diçingînin. Ew mîrekên xortan bi ser diketin, parçe dibûn, dilê min dîlan dikir.

Ku te dinêrî, birrên jin û zarokan, ji hevûdin ketî, şewtilî bi wan gastî û bênderan de direviyan. Ku esker li wir li wan direşand, mîna pezê gur lê bizîvire, bi heydêniyeke hawarî li hevûdin vedi-geriyan. Desmalên hinan diketin, çarikên hinan ber bi ba dibûn. Hineka ji wan dirahiştta çengê zaroka xwe li duv xwe dikişkişandin... Ya azinelleh...

îcar ez ji biraziyê xwe re bibêjim. Mala Kêlo, mîna min û we, pismamê me ne, Zaxuranî ne. Mêrên wan, mêrên bi sed mêrî bi ser

hevûdin de, mîna pezê darbe xwarî bi ser hevûdin de diketin,  
dibûne şikâr û ez di kêleka qumandarê Roma Reş de rûniştî bûm.

Min evîn kevin kir...

Min xwe kevin kir...

Du jin hebûn... Carinan dibûne sê... Ya sêyem weke alîkar ku tiştinan  
ji war tîne hû. Dihât û wînda dibû, dida der û ji nişkê de wînda dibû.

Her du jinên din ha ha, ha ha tivingên di destên xwe de bi kar dianîn.

Carinan yek li vê hêlê, yek li hêla din derdiketin mey- danê... Her du

di yek bejnê de, zirav û dirêj, çikçikandî, hunerek dikirin, hunerek

dikirin, ne dikarim bi nav bikim, ne dikarim biwe- sifinim; ne gotin

dikarin barê cengaweriya wan hilgirin, ne digarin nexşe bikin.

Malava, malava Xwedê, geh tiving di destên wan de bûn, bi mêranî

şer dikirin, geh destê wan li ber lêvên wan bûn

dilîliyandin. Tivingên di destên wan de dilîliyandin, zimanê di devê

wan de dilîliyand. Wîlo mişemir, bê parastin şerek dikirin nayê

gotin. Li serê banê Qesrê... Biskên pora wan, bizmikê zendikên wan

bi bayê tiving û heydêniya rojê re, li hev dihatin pêçan, pêl didane

xwe. Hevrîşme di nava miçekçekên gulî û berdevkê xeftanê wan, bi

tîrêjên roja li ber fîzzên û fiqêna beran qeto qeto diferfitî, birûsk

dibarandin. Tu dîzanê ku Qesir mezin e û banê wan yeker in, qes-

rên ku vê paşke bilind bûne, bi temtêleke parastinî ku xanî "

hevûdin qut nebin, rêbûwarî di navbera malan de çêbibe, hatî kirin.

Jinan ew qesir ji xwe re dikirine mertal û ji wir diçûm din. Li serê

Bircika Ferho dilîliyandin, diçûne ser bircika Mi. dilîliyandin û

dihatin anîşka xaniyê Esed şer dikirin, diçûne ser banê Hemed û

Xelîlê Batê şer dikirin. Bi mêran re ketin, bi mêran re rabûn, heya

dawî wan jinan şerê xwe kir û devê wan nekete hev. Du berê topan

li ser banê Haco ketin, du ber jî li banê qesra Hemed ketin, jin di



nava toz û duman, parçê kevir û kûçan de winda bûn, di xwe neanîne der... Pêça xwe nedane qotika ku ji ezmanan dihat û bi ser wan de dibariya. Heya îro jî nizanim ew her du jin kî bûn, min dixwest ku ji navdariya jinên Qere Qesriyan, wan baş nas bikim û heyra bi dawî min pirsî, min li duv wan kûdand ku nas bikim, kesî tiştêk ji min re ne got.

™îretkarê min Gebroyê îsayê Zettê bû. Ê min ew çûkê Tillûrî çengo nekir, bi xwe re şîbaq nekir nebire Amedê. Da ew jî bûbane hevparê guwê devê Cenabê Paşâ. Carinan dihate bîra min ku wî kurî bi dijminatî ev şîret li min kir. Bi dijminatî nikarîbû min, bi dostanî ez çê kirîm. Mêrikê ku nanê dewletê xwaribe ewletî pê nabe. Bêbext e!.. Bexîl e!.. Rovî ye, xapînokî ye!.. Sil e, revok e!.. Kurê roja xwe ye!.. Li gorî berjewendiyên xwe!.. Ji bo berjew- endiyên xwe, dikare bavê xwe bifiroşe!.. îcar Gebroyê îsayê Zetê bû... Kûnvirekî tamam bû. Hestiyên wî ji xwedê bûn, goştâ wî ji ba dewletê, devê derîstana dewletê bû, virr û teşqelên li xelkê dikirin, ji bo nasnameyekê ji daira nifusê bistîne bû. Bi dostanî berê min da vê riyê. Ji bav û kalan de dostê me bûn. Roja ku Elîk girte ser îsayê bavê wî, merem û kula sed û yek bavê Fillehên îsoka ji wan hiland,

qet ji bîra wan naçe. Car din mirov nikare li Gebroyê mîna gîskê peritî, qijika qirik xîzokî ewle bibe. Çiçikên dayika xwe gez kirine, nanê Tirkan xwariye, ava wan vexwariye. Bêbextî li cem Gebro yê mîna gîskê qersifî, qijika beritî pelê cixarê ye. Li gorî bayê rojê, pelê darê ye, çawa dibizive, wilo dilerize...

Du sê caran kete dilê min, ku ez bipirsim, ji Remo, ji hinek dostên kevin bipirsim. Ne tenê di derbarê kûnvirrê Gebro de, di debarê serdana Cenabê Paşê de ramanê wan fam bikim. Kengî, kengî li xwe dinihim. Wan dikime hevparê dîtin û serdana Mistefa Kemal Paşa.

Min xwe êxiste helwesteke wilo ku Mistefa Kemal Paşa bendeyî min e, wi bi zarê xwe yê şêrîn gazî min kiriye, wî xwestiye ku min bibîne. Bingeha rêza me, rêçika me li ser bingeha girêdana bi dewletê ve, bi têtikiya germ ya dewletê ve hatibû ava kirin. Dîtina Mistefa Kemal Paşa berz kirin, tekûz kirina tacîdariya min bû. Dar di destên min de bû şûr jî bigirime destên xwe.

eşîra me. Ez bende û parezgerê dewleta Romê me. Gebriko, rebenê Xwedê, weke gîskekî ku heft guran gap jê dabin qersifî mayê û nikarê Enwerko... Ez ribatê Tora Hevêriya ku min siltan û tacîdarê topa Hevêriya di binya Xetê re desrxist in, ez serekçeteyê dewleta Tirk im. Tu rabê xap û rîpan li min bike, tu rabê min bi xapîne? Kûnvirrê çepel î lewitî. Mîna Kuskekî!.. Kuskê ku li hevûdin hati- bê badan... Kuskê ku sînga wî hatibê perçiqandin û dengê wî di nava hestiyên kurkusî de, bi xîzênî derbikeve. Ku diaxivê, dengekî mîna cîrrêna denga Usifê Kesîro, xîrrêna ferê aşâ Usifê Sêrtê jê dihat. Erê te du pitik û nîv xwendine, lêbelê tu bi tevger û lîstikên civakê nizane.

Kes nîne, kes nîne ku serê min perçiqîne, pêl serê min bike, pêl serê min bike bi kurkusîne. Maleve!.. Maleve ez çawa, çawa bi yek gotinê ji rê bikevim, xwe winda bikim, biya Gebriko bikim.

Enwerko bi tenê kabokên xwe kirine zikê wî, nikarê tev bilive. Eger hiş û sewdanê wî têra wî bikirane wî pêşiya xwe veke, Enwerko safî bike, pêşiya xwe paqij bike. Ne dora min bû!.. Gebriko ku nikarê xwe biparêze, ku nikarê xwe mezin bike wê çawa min bi parêze, rê û şîvilan ji min re vebike, min mezin bike? Ya xaliqê mezin, ya xaliqê erd û ezman, ya xaliqê nafûr û kafûran dixuliqîne, ez çiqasî xeşîm û nezan derketim. Erê wî got, wî riya çûn û nehatinê da ber min, ez

çawa biaxapim, bawer bikim, ne dîtî ne bînayî, ne pirs bikevim ser riyân. Qet min bîr nebir.

Bi yek tif û pifê, çira min hate vemirandin, findika min tefandin. Ezmanê min î zelal tarî bû, stêrikên dilê min çilmisîn. Li nav ser û guhên xwe jî bidane xêr ne dikir. Cenabê Paşâ sohra min da min. Baweriyek berz di dil û mêjiyê min de hebû, ku ez ji bo dewletê qumaşê Hindê bûm; dirrê qatmanê heftan, dirrê rengîn ku mehtaba şevê, ronahiya rojê nedîtî bûm, bi yek carê wînda bû, firriya. Hawar nezanî!.. Min digot ez û ne tu"«î din. Min digot dewlet Midyad e, Estil e, Mêrdîn e; qereqola Midyadê, neferên têne gund in. Min qet bîr nedibir, qet, ku tif û pifa dewletê bi gu ye, dema difûre li dev û rûdêna mirov dikeve.

Ez çawa ji Amedê derketim, kete dilê min û di serê min de rûnişt ku tola min Gebroyê Isayê Zetê ye. Çawa bigihime Midyadê, ezê sûravkê Mistefa Kemal Paşa, guwê ji devê wî, mîna virika sewala zikêşî pijiqî nav ser û çavên me, di serê wî û heft bavê wî re bikime Li ber çavên min tenê Gebro, ku bûbû sersedema rêvingîtiya min îrêbenî û bûbû sedema diljariya min, hebû. Darbeke wiha xedar û mezin li min ne ketibû. Lawo Gebro, min tu xerabî bi te ne kiribû, bavê min jî tu xerabî bi te ne kiribû... Bilî qneciyê... Ev çi rê bû ku te da ber min? Hey kîr mêlek pav... Zaroka di patikê bavê te nizan- im çi kirî... Ku te ev rîya bi gû da ber min... Qenc e ji min û te re... Bîrinên dilê min bi navê wî, bi tola hemberî wî dijenîn. Gebro ketibû dewsa Mistefa Kemal Paşa.

o

o

‘Pismamê hêja û Delai, Kurapê mêrxas Hiseyn,

Silavên min, silavên Mir Celadet H te hene, dem têne guhertin, pêçveçûnên cîhanê mirov şiyar dike, ji nava şaşî û xeletiyên dikişîne. Edi bes e, her berekî çaq taziyên Ereban, li gastîneke çolistanê sînorek ji xwe re danî, ala xwe rakir, mîrekek, melikek rakir, bûne dewlet. Rim û mertalê dewletê, şûrê dewletê, tivinga\* dewletê ku kiriye destên te, hemberîpismamên te, hemberî hemwe- latiyên te, te dide peş, bi kom û nijdevanî tu hemberî pismamên te, hemberî welatliyên te dide piş, berbide, bike bin axê, veşâre. Kew bi refê xwe re, heran û nêrî bi keriyê xwe re, mêr di nava rafê pis- marn û komên xelkên xwe de... Dijmin çawa ji gorbihîştîyî bave te re ne bû dost û yar, ji te re ji nabe dost û yar... Tu mezinê min, were bibe sertacê me teva. Bo em hemberî dewleta Roma Reş şer bikin, çarenûsiya xwe bikin destên xwe. Ez û Mir Celadet li serê Bagokê ne, bendeyî te ne. Were li ser kursiyê tacîdariya me teva rûne. Min dil nine ku careke din, xwe bi xwe bikevine pêşîra hev, berê tivingan bidin hev. Em hevûdin ji teresbavên Tirkên bêbext re bikin çêlkew. Bi her sê navê Xwedê, bi gora kuştîyî bê kêl, were bibe tacîdarê serîhildanê, emê şikal û pêlavên te deynin, xizmeta te bikin.'

Gotinên di vî rengî de...

Rojeke di nava agirê dijwariya germa Tebaxa Havînî de pêçayî, ez bi koma nijdevanên xwe re, piştî li nava Êzîdiyên Kevnasê, Bacinê ku ji zezûlê serîhildanê qafandî mabûn, vegeyriyam, li odê rûniştî me. Li dora min birrê mêran hene, Êzîdî ne, Filleh in, gundiyên derdoran in... Pirranî Êzîdiyên Kevnasê ku çend xanî, li berojê hemberî nizarê ber bi Rayitê dirêj dibe, dused metroyî dûrî fetlînoka rojavayî şêxanê, mîna dîlzariya xwe ya rebenî ava kirine, li odê ne. Berî hingî

bi saetekê em li meydanka pêşiya gund, li ber siya 'dara bi tenê' ; li ser doşekân, mîna dilê zerzulê ji refê xwe qetiyayî, di nava herhilîbûna bêzarî de mayî, lê bi perdeyên çeyizê bûkan ku ji ber talanê, ka çawa, bi çi rengî xelas bûne hatine nixu-mandin, rûniştî bûn. Mirovekî di gurra xwe de, di nava xwehdanê de westiyayî, ji halketî ji neqebka Qijikê da der û ber bi mala me hat. Hat û hat li ber dergihê qesra min rawestiya. Bi dengekî westiyayî silav kire zilamên serê ban. Bêyî bifermo kirina hindurû Berî ku ew bi axive mn jê pirsî:

-Mirovê delai, pirsiyariya şermê tê nebe, tu ji ku ve tê, tê bi ku de biçe? Yan heya bi vir? Xwedê xêr bike, derde te çiyê ku em bibin derman.

Mêriko li xwe ewle bû.

-Axa, ez Kercosî me. Navê min Mihemed <

Ez beşîşîm:

-Ser çavan xortê delai, vê kelkela Havînî tu ji ku ve tê, tê bi ku de biçe?

Mihemedê Kercosî, bi dilekî safî:

-Axa ez ji cem Haco Axa tîm, min nameyek ji bo te aniye.

Aveke sar, di nava berfa çardehê Tirmeh û Tebaxê de ku xeşîmkên zinarên Bagokê de maye, bi ser dil û hinavên min de bir- ijînin, bela bû. Şilahiyeke demûşî sar, tîr tevzînok di nava hinavên min de peyda bû. Min bihîstibû ku Haco û Mîrekên Bota hatine Bagokê, lê qet min bîra mirina xwe dibir ku Haco nameyekê ji min re rê bike ne dibir. Min ji xwe re digot, mîna her car wê li talan û tolê bigere û vegere. Gelek caran komên nijdevanan dişandin, serx- et dibûn, bi ser xelkên ku meremên wan bi wan re hebûn de digirtin, tola xwe distandin, li piyê paş vedigeriyan. Êdî, ketibûne nava rewşeke

tolhildanî, armanc û daxwaza wan î mezin, di nava xwînê de, di nava rebenî, bêzariya koçberî, qirkirina Eleqemşê de xeniqî

hinkahî, di nava bêhn û bixara şînahî, zîndebûna Biharî de, di nava germ û diwariya biraştina Havînî de, di nava çilmisandin dilê jiyana pelezerî Payizî de, di nava seqem, berf û 'kafur a çirav û zuwabûna Zivistanî de, bê rawestandî, bê razan, ha ha diherike, ha ha axê dixepêre, neperûşkbî xwe di rûdêna lat û kuçan de diçikîne, bi kurisandineke birçî cihê xwe dixepêre, diherike, cihê xwe di nava 'sewm-û selatê' erdê de çêkiribû, di nava ra û tarîşkên laşê min de diherikî.

Navbera min û Ava Mezin fereh bûbû.

Navbera min û Mihemedê Kercosî fereh bûbû.

Navbera min û dewletê fereh bûbû. Navbera min û Amedê fereh bûbû. Navbera min û pismamê min, navbera min û cilê li ser bedena min fereh bûbû. Navbera min û hespê ez li ser piştê wê, navbera min û hevalên min, navbera min û Reno fereh bûbû. Navbera min û jiyane fereh bûbû. Marmarotka li ->er zeqafa latikê, kermâşa di nava rîxê de keskê xemrî bûye, çiqasî nêzîkî hev bûn, ez û dewlet, ez û Gebro, ez û dilê xwe hewqasî nêzîkî hev bûn. Dilê min, hewnê min, mêjiyê min qêbil ne N ia êdî. Reşbîniya min bûbû rêzaniya min. Kew bi refê xwe re, heran bi keriyê xwe re, mêr bi refên pismam û komên xelkên xwe re: Were, bi her sê navê xwedê, bi gora miriyên bê kêl, bibe tacîdarê me... Emê şekal û pêlavên te deynin.

Kewê bi tenê dîlzar e, peza bi tenê guraxwar e, mirovê bi tenê nêçîra lijmînê dijwar e...

Her sê jî ketî ne...

Ez bi gotinê Gebroyê Isa Zetê, ku mîna gîskekî vimî ye. xelitîm, şaş bûm û tacîdariya bi destên xelkê ku ketibûna xwîna bavê min şemitîm.

Tacîdariyê çavên min kor kiribûn. Tacîdariya min ku bi destên xelkê dihate sazîkirin, dawî bû gora min î bi saxîtî. Qîma min bi tacîdariya hemwelatîyên min ne dihat. Rîyek li ber min vebûbû, rîyeke keşkûlî ku wêranî, mirin, koçberî di ayîneya paşerojan de xuya dikir bû. Kengî, kengî qîma xwe bi çarenûsiya Haco, ku b pêlên demê ketibû tînim.

O

Niha, niha ez ketibûme ber şîbaqa Kurra Bûkê, dilê min mîn zerzûlê ji hev de ketî, bi herka Ava Mezin re, li qeraxî diket, dipekî qeraxê din.

Çîroka Qijikê û Teyrê Sîmur bû. Teyrê Sîmur î nikil bi gu...

Û min hêvî ji Qijikê dikir.

&

TEYRÊ SÎMÛR Û QIJIK

Gotin hene ku şarezaiyö kor dikin.

U şevên me jî zikêşî, ku di nava cebla bi haveynê gemar û fiji' ka bê kewniyê de meyî bû, êdî dil û mêjiyê me bikêrî ragirtina bûyer û pêhatiyan nediiat. Kabokên me fiziha bûn, dilê me kasûlî... Dîtin û bînahiya awira me şikestî...

Em hevalê Qijikê bûn.

Roj di nava mikewniya ber êvarî de, bi renekî tevlihev, gelcoyî zereve erd dimişt, xwe ber bi welatên nediyar de berdida. Têhnika bayekî, ji ser kefika pêl û şelkên Ava Mezin dibizivt; ne bi tuwî ji kûraya erda rast çend bablîsokên ziravik ristin, di cih de winda bûn, çendeke din ji dehm de rabûn, çawa çêbû, çaw gihane hev, di

demeke çav miço-belo kirinê de li hevûdin qeliptin, serûbinê hev bûn, yek bablîsok derkete meydana, leyist, ket û rabû, qirş û qal li dora xwe dane hev, gûtin, strîzerk, pelên fereh î gûrîzê mîna piştiyekî ristî, li hev badan, li nav milên xwe kirin û hilanî. Bablîsok mezin bû, li nav serê çend dar û deviyên di tixubê erd û zeviyan de arz-i endam dikirin ket, toz û remedîlka derdoran li xwe da hev, bilind bû. Zirav bû dirêj bû, rist. Rist û toz û remedîlk li nav ser û guhên xwe bar kir. Hat û hat!.. Hat û hey hat, li nava firazeyên têr qesele re xwe li hev ba da, qesele, pûş û geya, dar û remedîlka li ser şartîl û kêstekên erda rast li hevûdin da hev, di nava qemeriyêke gewrik de hate pêçan, ji rengê dikete rengê din û li dora xwe zîtirk dan.

Bablîsokê rist û dilê min rist.

Başokeyê bi tenê di kûraya ezman de, baskên xwe li ser banê şînxal iyê raxistibûn, li gorî kêfa xwe tewl didane xwe.

Dîlzariya Teyrê Sîmûr, bi dîlzariya dilê min re, di nava hes- ûdiyêke şikestî de tewl didane xwe.

Teyrê Sîmûr, bi du-sê Baz û du-sê Başokeyân ji xwe razî li serê zinarekî bê tirşe textê xwe vegirtiye û li berriya hemberî xwe ku heya çavên te dibirin dirêj dibû, dinêrî. Teyrê Sîmûr, ku tacîdarê teyrik û tûrikan teva ye, bi wê kûbkûbandina xwe, bi wê maqûltiya bê hember xwe dibêje Baz û Başokeyên dora xwe: 'Rastî em gelekî xam bûne û me bêriya nêçîrê kiriye. Ku hinek kesan saloxdariya derdoran ji me re bidane emî gûrrekê li xwe bidin û tewlekê bidine xwe! Hê gotina Sîmûr di devê wî de Qijikek ji kûraya berriya hember ber bi wan hat.

Teyrê Sîmûr dengê xwe li Bazekî ji wan kir û got:

-Ha gidî, ber bi wê Qijikê here û raçengî xwe bike, bîne.



Baz, gûrr da xwe û di ser serê Qijikê re rist, raçengî xwe kir anî dîwana Sîmûr.

Teyrê Sîmûr dengê xwe li Qijikê kir:

-Bêje çûkê min, çi heye çi nîne. Tiştê ku te xwar, te vexwar ji te re, tiştê te dît û bînaye ji me re bibêje.

Qijikê qirika xwe zu w a kir, sînga xwe werimand û got:

-Hooo Mîrê min, hun li vir rûniştî ne, li berriya Xelef Axa, binya Bagokê, qotikê li sewalê cih daye, her roja xwedê sed dewar, sed pez dikeve. Tu goçtê hespan dixwaze, tu goçtê bergîr, ker û golikan dixwaze, tu goçtê meh, beran û gîsk û nêriyan dixwaze, karik û berxik li qirika keran e.

Qijikê xweş kir, got û beland, kir ku av bi devê Teyrê Sîmûr û civata dora wî ket.

Teyrê Sîmûr li Baz û Baçokeyên dora xwe nêrî. Berê xwe da Qijikê:

-Çûkê min tu çiqasî xweş dibêje.

Bazekî ji xwe razî, di cihê rêze de rawestiya û got:

-Mîrê min tê çawa biya Qijikê bike. Hinekî din raweste, belkî hinek ji çûkên din bîn, em bipirsin, li gotinên wan guhdarî bikin, bûyerê serrast bikin, piştire.

Gotina Baz, kete serê Teyrê Sîmûr.

Destûr dane Qijikê û dêhnê xwe dane derdoran. Ne bi tuwî Qijikeke din ji kûraya berriya hember ber bi wan herikî hat. Teyrê Sîmûr dengê xwe kir. Başokö duyem, bi çîqênîyekê li xwe da û çû di ser serê Qijikê re rist, şibaq kir anî dîwanê.

Teyrê Sîmûr:

-Çûkê min bêje, çi heye çi tune. Te çi dît çi bînaye. Tiştê ku te xwar û vexwar ji te re, tiştê ku te dît bêje mîrê xwe.

Qijika duyemîn jî mîna ya pêşî, sînga xwe nepixand, çavên xwe wir kirin, bi kûbariyeke mezin dest bi axaftinê kir.

-Ohoo Mîrê min, li Berriya Xelef Axa goşte sewalên cûreyî li qirika keran e. Tu çi cûreyî, çi nifşî, di çi temenî de dixwaze heye. Qotik ketiye nava sewalên xelkê cih. Kişûmet!.. Rojê sed, dused serî sewal dibe kelaş, li wan gastînan dimîne. Hun li serê van zinaran rûniştine, lawirên bê per û bask bi goştê taze xeriqî ne. Kûçik, Torîk û Kurebeş ji goşte taze ciz bûne.

Teyrê Sîmûr destûra Qijikê da, bi rê kir û berê xwe da Baz û Başokeyân dora xwe.

U got:

-Gelî serkêş û serbazên Çûkan, Qijika pêşî got me di nava bêbaweriyekê de guh nedayê,. Me got, Qijik derewan dike, ji bo xwe bi me xweşik bike, gotinan li duv hevûdin rêz dike. Qijika duyemîn jî hat û aynî got. Hun çi dibêjin.

Baz û Başokeyân dora Sîmûr, bi dengekî birêzî, serê xwe tewandin û gotin:

-Ferman ya Tacîdarê me ye.

Teyrê Sîmûr, Baz û Başokeyan gûrr li xwe dan û ber bi Berriya Xelef Axa firiyan. Piştî sê gur û sê tewlan, gihane kopirê serê Bagokê, li serê zinarekî, ku bêhn û bixara goştê kuştîyân Osmanî U Ittihadiyan ji derdorên wê dihat danîn. Di nava kewijandineke birçî, ji kar ketî li derdoran nêrîn. Nerîn ku heylooo, ew deşta fereh ji kelaş û termên dewar û pezên şikâr bûyî dagirtiye. Bêhn û sifteke giran î zelîqonkî bi ser cîhanê dikeve.

Av bi devê Sîmûr, Baz û Başokeyan ket.

Teyrê Sîmur dengê xwe li Baz û Başokeyan kir:

-Me ji Qijikên reben bawer ne dikir, hun dibînin çawa heleza xêr û bera demsala Biharî.

Gûrrek li xwe dan, di kûraya ezmanê Berriya Xelef Axa de fereh fereh li dora xwe zîvirîn. Çûn û hatin, gûrr li xwe dan, geriyan, her yekî kelaşekî mezin raçavî xwe kir, çûn li ser danîn, li kêfa dilê xwe dest bi xwarina goştâ taze kirin. Teyrê Sîmûr li ser kelaşekî mezin ku hemberî qesra tacîdarê heremê bû danî, bi dilekî aram, di nava maqûltiya tacîdariya textê erd û ezmanan dest bi xwarinê kir. Wê kêlîkê kurê tacîdar, ku wêretkî bi tenê ye, li ser dilê bav û dayika xwe mîna şekire şamê şêrîn e, di pacê re li derve dinêrî. Çawa çavên wî li Teyrê Sîmûr ket, destê xwe ber pê dirêj kir û got: 'Ez wî teyrikê han dixwazim.' Tacîdar di pacê re nêrî ku Teyrê Sîmûr e, dengê xwe li segwan û şewrexiyên xwe kir. Segwan û şewrexiyên tîr û kevanên xwe anîn û li ber Teyrê Sîmûr rûniştin.

Kurik di nava hinirandineke zarokî de got:

-Ez wî teyrikê sax dixwazim.

Bavê wî di ber dilê wî re çû hat, gotinek ji vir anî, yek ji der din anî û got:

-Kurê min, segwan û şewrexî wî na kujin, ji bo dikaribin bigirin wê lingê wî, çengê wî birîndar bikin.

Kurik lêvên xwe li ser hev suwar kirin, milên xwe hejandin, xwe zîtikand û got:

-Naa, naaa!.. Ez çûk sax, ne birîndar, sax dixwazim.

Tacîdar, bangî şêwirmend û wezîrên xwe kir, li dîwanê rûniştin; mijara girtina Teyrê Sîmûr, bêyî ku birîndar bikin û girtinê danîne masetê, ketin nava gengeşiyêke dûr û dirêj. Em çi bikin, çawa nekin... Kurekî bi tenê ye, li ser dilê Mîrê wan î bê dûnde, bê war gelekî, gelêkî şêrîn e. Ew şêrînê dilan, ezîzê ber dilê bav û dayika

xwe, mîrê paşerojan, bêyî birîndarî Teyrê Sîmûr dixwaze, ewê çawa dikaribin bigirin.

S

bêhna goştê tazê dike. Dewareke gir, ku nikaribe rahêjîyê ser jê bikin, xwîna tazê birijînin, deynin gastînekê.. Lê çalîkekê dibin kelaş de bikolin, du zîlamên bi xwe bawer, bi zend û bend di çalîkê de rûnînin, ser wan bigirin ku neyêne dîtin. Teyrê Sîmûr wê bêhna xwîn û goştê taze bike, bê ser termê kelaş deynê, zîlamên di çalîkê de veşartî bila xwe çeng bikin lingên wî, bigirin.

Kêfa tacîdar û hat û ferman da.

Kalê kohne dengê xwe kir:

-Ezbenî, bila çend mêrên din ku bi xwe bawer, bi zend bend, nêzîkî kelaşê dewarê rawestînin ku mirovên di çalîkê de lingên Teyrê Sîmûr girtînin, bibezînin alîkariya wan, na xwe, na xwe Teyrê Sîmûr bi hêz e, bi tenê demakevê nêçîrê, xwe mişemir bernade. Her dem li dora wî Baz û Başokeyân yekaneyî hene. Başoke û Bazên yekîneyî dikarin bi mêran re şer bikin Ku hinek kesên din bi hawara wan neçînin, wê zîlamên diçalîkê de çêbikin, bi mûr û nikilan, wan kor û şewtilî bikin, dibêr kelaşê dewarê re, bi mirîtî dirêj bikin.

Mîr ferman da, di cih de dewareke stûr birin gastîne, ser jê kirin, çalîkek kolan û sergirtî kirin, du mêrên bi xwe bawer, bi zend û bend di çalîkê de rûniştînin. Çar-pênc mêrên din di piştê dîwarekî ji wan de melisînin, bendeyî Teyrê Sîmûr man.

Teyrê Sîmûr, Baz û Başokeyân dora xwe roja berîtir zikê xwe bi goşt dagirtibûn, li serê zinarekî ketibûne kêf û yariyan. Çawa dewara stûr hate gurandin xwîn rijîya, zikê wê qelaştînin bêhn û bixara goştê tazê ber bi ba bû. Dibêjin ku Teyrê Sîmûr bi bêhn û awira xwe gelekî zîreke e. Di cih de bêhn û bixara xwîna rff, goştê tazê kete fimikên pozê

Teyrê Sîmûr. Du-sê caran bêhna xwe da û stand, berê xwe da Baz û Başokeyen dora xwe/

-Hun jî bêhna xwîna nû, goştê tazê dîkin?

Teva serê xwe hejandin, gotina wî pejirandin,

-Belê ezbenî, bêhn û bixara xwîna nû û goştê tazê hate me jî.

Gur li xwe dan, di ser kelaşê nû re ristin. Teyrê Sîmûr ji dehm de xwe dehland û hat, hat li ser kelaş danî, mîna her roj bi dilekî aram dest bi xwarinê kir. Baz û Başokeyân din, li ser kelaşân din bela bûn, li gora dilê xwe kelaş neqandin, li ser danîn û dest bi xwarinê kirin. Hajê Teyrê Sîmûr ji bayê felekê nine, bi dilaramiyeke şemi- randî, di nava ronbîniyeke dilsoz de xwarina xwe dixwe. Ji nişkê ve her du zilaman xwe çend kire her du lingên wî û bangî zilamên din kirin. Heydênî li zilaman, li qonaxa tacîdar ket û bi hawara wan ve beziyan. Teyrê Sîmûr gittin. Heya Baz û Başoke bi xwe hesiyan, hasil giha Musil. Baz û Başokan li xwe dan, di ser serâixoma zila- ^ man re ristin, xêr nekir, Teyrê Sîmûr berdest kirin û devê rekiha >A hesinî li ber qufle kirin. » A

'eyrê Sîmûr anîn, çend mêrên ji xwe razî bi radorî canê wî ketin, çengên wî pirtikandin û berdana oda kurik. Teyrê Sîmûr, ji erda- xwedê ket, li nav ser û guhên xwe da, xêr nekir, çengo bû û di odê de hate asê kirin. Kurik jî di dorê re diçe û te, pê dileyize, geh pê şah dibe, geh mirûsê xwe jê dike, hêrs dibe, bi tûjik û quredaran ber pê diçe, geh dixawaze dilê Teyrê Sîmûr xweş bike, goştê bê hestî didiyê. Teyrê Sîmûr ji dilkulî û kerba ne dil dike bixwe, ne dil dike bi kurik re bileyize. Di keribe, di helike û li nav ser û guhên xwe dide. Hawar ey xaliqê erd û ezman...

Hawar ey rekiha hesinî û dîlbûn...

Hawar ey kulîlkên xwînê...

Hawar ey hêviyên şikestî...

Baz û Başoke li serê zinarekî ji wan li xwe danîn. Ka em çî bikin, çawa bîkin ku tacîdarê xwe ji dîlbûna nav lepên mirovan xelas bikin. Tacîdarê wan ketibû kemîna mirovan dîl bûbû... Teyrê Sîmûr, nîşanî û sembola azadiyê, tacîdarê teyrik û tûrikan nikare dîl bijî. Wê birmr, 'hu'rî mirin e. Dîlzarî wê Teyrê Sîmûr ji derd û kulan bikuje. JTaybetiya Teyrê Sîmûr, navê teyêrê Sîmûr, rizgarî û serbestî ye. Dîlzarî, dilê wî yê xalî cewher pûç dike, mêjiyê wî kurmî dike, demeke kin wê bifetise. Baz û Başoke ya xwe kire yek, şêwra xwe kirin, bi çî awayê hebe, mefer serê hemberî mirovan be jî, ku wî birevînin.

Lê çawa?

Bazê sersipî, piştî bêhnikekê ku bi xwe şêwirî dengê xwe kir:

-Gelî serkêş û serbazên çûkan, cengawerên bi nav û deng. Eger em bi bîrewerî neçin ser mirovan û wan ne xapînin, em nikarin bi wan. Em lawirên bê çek, nikarin şere mirovên bi tîr û kevan bikin.

Baz û Başokeyan pirsî:

-Çi di serê te de heye bêje.

Bazê sersipî dest pê kir:

-Du kes ji me, bi çî awayê hebe, pêwiste ku xwe bigihînin Teyrê Sîmûr û qewêtiyan lê bikin. Bila Teyrê Sîmûr xwe berrî neke, xwe kedî nîşan bide û sil nebe, ji kurik ne reve, pê re bileyize. Bo lê ewle bibin, baweriyê pê bînin. Benîademên şîrê xaf mihtiyê, zu dixape, dilsoziya wî di gotin û galgalên pesinandinê de veşartî ye. Ku bawerî pê anîn, pêşî wê devê rekiha hesinî vekin, piştê wê devê odê li ber vekin. Ew jî nivê azadiyê ye. Ku ji odê derket têkiliya me wê bêhtir pê re çêbibe. Hin bi hin wê pirtik bi çengê wî bînin. Ku dîtin kedî bû, careke din wî çengo nakin. Eger xwe berrî bike, metroziyan

bike, serawan ji xwe derbixe, her dema ku pirtik pê hatin wê, big çengo bikin, bo nikaribe bifire. Eger xwe kedî nîşan bide, bi ] bibe heval, raçengî ket û pê re zîtirk dan, li wan gastînan dane xwe, pirtikên baskên wî jê nakin û çengo nakin. perê wî hatin, xelasî û revandina wî ji dîlbûnê hêsa ye.

jonaxa taci-

darê heremê re ristin. Nêrîn ku kûlek, mîna nîv pacê di navbera ban û sîwana deriyê raserî anîşka rojhilata oda kurik de heye û kes li derdoran nîne, xwe ji dehm de dehlandin, li devê paceka kûlekî danîn. Teyrê Sîmûr bi tenê di anîşkekê ji ya odê de melisî bû, di rewşa xwe, di rebenî û dîlzariya xwe dipûnijî.

Bazan nikilê xwe li camê dan û dengê xwe kirin:

-Ezbenî dilê xwe bi xwe ne şewitîne û dilaram be. Xwe bike dilê kurik û sil nebe, xwe kedî nîşan bide, bo li te ewle bibin. Ku li te ewle bûn, bawerî bi te anîn, wê te ji odê derbixin, ew jî nîvê azadiyê ye. Hingî têkiliya me bi te re bêhtirîn çêdibe. Bêhna xwe fereh bike, xwe bike dilê kurik û pê re bileyize ku guh bidê te, te baş xwedî bike, hêdî hêdî wê pirtikên çengên te çêbibin. Ku tu xwe kedî nîşan bide û bi kurik re bibê heval, te çengo nakin. Ku pirtik bi te hatin, kar hêsa dibe.

Gotinên Bazan di serê Teyrê Sîmûr de rûniştin.

i nava dîlzariyeke bê bersiv de ji xwe re got: Bar li ser milên min e, kesî kes azad nekiriye.

Çawa kurik hat, Teyrê Sîmûr ji anîşka odê derket, ber pê çû û pê re yarî kirin, xwe fîtoskî kir, pê re leyist. Kêfe kurik hat, dilxweş bû bibez derî vekir û Teyrê Sîmûr raçengî xwe kir, derket. Bav û nobedar û qerwaş ber bi wan beziyan, kirin heleme gotin Teyrê Sîmûr e, ranawestê wê bifire, wê bifire û te jî bi xwe re birevîne, çawa tu

derdixe derve, destûra wî nede, kedî ne bûye, hîna sil e, berrî ye, bila baş fêrî derdoran bibe... Kurik dengê xwe li wan kir û guh neda wan. Destên xwe di ser Teyrê Sîmûr re bir û anî, Teyrê Su ~ '\* xwe pê firkand, bi dengekî têr yarî xubxuband. Teyrê Sîmûr û bi hevûdin re derketin nava gund. Ji wê rojê û pê de Teyrê Sî benderan û vedigeriya mal. Kurik û qerwaşan, nobedar û aşpejan teva guh didanê, xwarina xweş û goşte bê hestî, safî sor, bê ra û bez didanê. Teyrê Sîmûr bi xwe dihat û bi hêz dibû. Her roja xwedê bi Baz û Baçokeyên xwe re hev didîtin, şêwra xwe dikirin, rê û şîvîle raçavî xwe dikirin. Di nava şêwreke mezin de, plansaziya xelasiya ji dîlzariyê amade dikirin.

Teyrê Sîmûr her roj, carekê baskên xwe azmune dikirin, gûrr didanê xwe. Di dît ku her roja xwedê çêtir dikare bask ku perrên xwe bi kar bîne. Pirtikên perrên wî hêdî hêdî mezin dibûn. Bi xwe dihat. Car caran dida xwe, perrên xwe vedikirin û li dora kurik difiriya.

Eger mehek, eger sê meh di navberê re derbas bûn.

Roja azadiyê hat.

Her du Baz hatin û li devê paca kûlekî danîn, milê xwe dane pacê û ber bi tilekî vekirin.

Bangî Teyrê Sîmûr kirin:

-Ezbenî gûrrekê bide xwe û were.

Teyrê Sîmûr, berepaş bû, çû ber dîwarê hemberî pacê û ji dehm de xwe hilda, baskên xwe li hevûdin dan. Çû lu ser kevîka paceya mîna kûlekê danî. Çawa kulabên xwe bi anîşka kevirê devê pacê ve şidandin, ji xamî û qelewî nikûbî, bi ser nikilê xwe de ket. Da xwe û rabû. Baza nêrî ku nikilê tacîdarê wan bi pîsî ye.

Bi dilekî tirsonekî:



-Ezbenî ew çiyê li ser nikilê te?

Teyrê Sîmûr nêrî ku guwê pîsîkê ye. Serê xwe bi zac, hêrs, bi dilekî nexweş, madekî tirş hejand. Gu ji ser nikilê Teyrê Sîmûr

Bi dilekî şikestî got:

-Hevalê Qijikê, nikil bi gu ye.

icar em bûn birazî...

Me biya Gebroyê îsayê Zetê, nêçîrvanê luta kir.

Mê pêl hewqas gorîstanên bê kêl kir, me pêl hewqas xwîn, bê mîraziya keç û xortan kir. Em ne Seyfûl Milûkê her du cîhanan bûn. Me bêhtir ji tîrêjên rojê brûskên meterilyozan bi ser xelkê de reşandibûn. Me bêhtir ji pêlên Ava Mezin qîrên û waweylêya jin û zarokan bihîs- tibû. Sêwirmendê me Oijika deng Cirdikê sîng guvaştî bû.

Di nava sê şevan de xewnên kasûlî, li ser peleguha neynika dil de, dilê şikestî, gotin û reçbelekên nameya Mihemed Çawuşê Kercosî de, hest û pûşiyân di nava heste û kevir de, şewitî, kizirî bi xwê, ava semitîfya suravkî de belqitandin. Bi rêwingîtiyeke têr qeşmerî vedigeriyan. Bablîsoka dilê min, di nava asoyên mêjiyê min î di nava çavzerkêya kuçtiyên singo û qesetoreyan de, bi berê topan herhilî, bedidî, di nava belengaziya rûşiştî, bê wate de, bi Neyzanê dîlzar, bi kewê derengmayî re dirişt. Dîlzarî û hejariya dilê min, di nava kasûliya nezanîna hewqas salên qurifî, qersivî de, di nava pâşmalk û bexçika poşmanî û gemar û cefta sê-çar gotinên Cenabê Paşê de tewl didane xwe.

irazî tu şer nas dike? Teqîna bomban, borbarduma- na balafiran. fişekan, lorandina mozoliyan. welîn û xiriq xiriqa tirsê, sehwa mezin û reva ji ber mirinê?

Roja ku di kefa mista te de darê tivingê rûnişt. qeftê xen- ceré bi teliyén destén te re bu destûbirak, ji min re béje te-ntene te dibe çend. Ku ez ji birazîkê xwe re çend gotinén di nava salén kevnare de winda mayî bejim. Serpêhatiyén bi beré topan hatî parçe kirin. Serpêhatiyén bi riyên winda, çevên kasuli û bexil re bûne destûbirak... Bi darbeya xencer û beré metrelyozan birindar bûyî. Devê birinén ku zincîra se- atî û guhikê jarê bostek û çar tciyan té de xcwr dibin, lier serpêhatiyek bi xwînekê hatiyê şîştin, hcr buyerck ku di na-va awaz û hawara jinôn bi de hatiye kefen kirin, her serpêha- tiyeke ku di nava dilé keçikên evîn şikestî de hatiye veşartin, ji te re bêjim.

Xorto, serpêhatî û bûyerén min di defter û pirtukên dibis- tanan de nînin. Di nava rûpelên ansîklopediyên sedsala bîs- tan de cih ne girtine. Teva di nava salén winda. rojén şikes-tî, coxrafya kura bûkê, dîroka talankirî de razayî ne.

Rojén hejmartî!.. Rojén min hejmartî ne, îsal nebû, yekî din, yeki din nebû yekî din... Sal ku ketin ber şibaqa hejntar- tiné, nririna çavreş nézîk e, wê béte serdana te, bi pateyeke Romanî 'xurfanî' bilorîne. Pîrbûn!.. Waré ne tukesan e. Qo- naxa kura bûkê ye!. Qonaxa çerxa feleka têr gevzînok û têr xapînok e. Bircikên dilé mirov di lerizînin. Qerntîçonkên li hev badayî di rûdêna mirov de rudinin. Tu nikaribe xwe a-made bike, kopal te dibîne. Xelasiya bînaya çavan te dipêçe. Binêr, kopalê destén min ji Binya Xetê, cem pismamê min hatiye. Pismamê min ku ez bûme têba, ez bûme xewneke gi- ran û di serdilkê wî de runiştim şandiye. Roma Reş ne bes |bû, ez jî ketim

zîqa wan û bi birr û qeflên mêmên simbêl qey- tan re eriş kire ser wan. Ne carckê, ne diduwan!...Ne carekê, ne diduwan û ne di şerekî bi tcnê de!... Bavê min dest pê kir, iheva uiha min û cm binêrin wê bigihê kuderê...

D 1999 5799 22

\*\*

## MEHKÛM

www.nefel.com

info@nefel.com

NEFEL

1

MEHKÛM

2

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

M. ELÎ KUT

NEFEL

Stockholm

2002

www.nefel.com

info@nefel.com

3

M. Elî Kut:

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com

info@nefel.com

© M. Elî Kut û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-89687-07-8

Çapa kevin: Welat 1994

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike  
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Nêverok

Serûpê .....  
.....7

Bavfile .....  
..... 12

Dilê dê .....  
..... 16

Mehkûm .....  
..... 19

Ez û heykel .....  
..... 28

Keçika piçûk .....  
..... 32

Ken .....  
..... 35

Xewneke şeva zivistanê .....  
..... 37

Reşbelek .....  
 ..... 42

Tabût .....  
 ..... 45

Terorîst .....  
 ..... 52

Teyrekî zêrîn .....  
 ..... 58

Tirşikçî .....  
 ..... 61

Dilop .....  
 ..... 67

5

Mîrê Emgîonê

mîrekî kurd

Li Vlachernê girtî

Pêşkêşî agirê te dike evê axaftinê:

Dûşîza ko kesek ne xwedî ye

dûşîza ko ne xwedyê tişteki ye,

Ruhê min ji min re goti bû

ko ez ê li hemberî wan serî hildim

Ger ko serê min evê gavê

Li ser darekî daçikandî li ber derî be jî

Fikra min li ba te ye

Dûşîza ji Agir û ne ji Tişteki

Gunanar Ekelöf

Dîwan li ser mîrê Emgîonê

6

Serûpê

Gemşo wexta di deriyê hewşê re derbasî hundur bû, pîreka wî, Nûrê ji

mêj ve tifik amade kiri bû. Beroş, textik û kêra xwe jî li ber tifikê danî bû.

Ji mêrê xwe re; »Qewet be ji te re!« got û telîs ji destê wî girt.

Gemşo, tenê

got; »Divê ez bi lez destlimêja xwe bigirim ko bigihim nimêja nîvro bikim.« Paşê jî rast çû hundurê odê.

Nûrê li keça xwe ya mezin qêrîya ko ji bavê xwe re misîn tijî av bike.

Bi

dû de jî bi kêf û zûzûka devê telîs vekir. Bi vekirina devê telîs re bîhna

serûpê û hinekî jî ya hûr li hewşê tevî belav bû.

Bîhn ê çû be kûçikê malê Beşo jî, ko ji ser sergo bi lez hate hewşê, li ber

Nûrê sekinî û teriya xwe livand.

Pisîka malê jî ji sibê de li axur, li mişkekî ko ji nav lepên wê reviya bû digeriya, lê heta nuha jî hêj zeft ne kiri bû. Pir jî birçî bû bû. Gava wê jî

bîhna serûpê kir; dev ji lêgerîna mişk berda, rast xwe li bîhnê girt û hat...

Lê bi hatina xwe pir poşman bû. Bi zora heft belan xwe ji nav lepên Beşo xelas kir. Bi şûnde çû axur, dîsa li mişkê xwe geriya. Lê bi hatina xwe

qismetê Beşo jî birî; Nûrê hêrs bû, kevirek li newqa Beşo da û ji hewşê

berdayê.

Nûrê ser û lingên mîhê li ser argûn qenc kizirandin. Dûre jî li ser  
textik

bi kêrê baş xeritandin; serê mîhê jî ji hev ali kir û gazî keça xwe kir  
ko

avinê bîne ji bo serûpê bişon. Ev karê han di wexteke pir kurt, weke  
nîv

saetê de xelas kir. Tenê kelandina wî ma bû...

Lê hêj hûr û roviyên mîhê li wir, ne paqijkirî bûn. Çendî wext diçû,  
di

bin germiya rokê de bîhna wan pîs dibû. Nûrê hûr û roviyên mîhê  
xistin

teşteke naylon, li pişta keça xwe kir û ew şande ser kaniyê da wan  
li wir

bişo. Bi vî awayî jî ji bo şîveke din jî haziriyên pêşin hati bûn kirin.

Nûrê çû kîlerê, legana xwe ji kîsê birxul nêvî kir û vegeyriya hewşê, li  
ser

dikê rûnişt û dest pê kir gûmişk û hin tiştên din ko ji birxul ne dihatin  
hesibandin neqandin.

Heta wê çaxê herdu zarokên wan ên biçûk jî ji nav gund hati bûn  
malê.

Herdu çûn li teniştaya diya xwe rûniştin û alî wê kirin.

7

Gemşo wê rojê bêkêf xuya bû. Nûrê di bêkêfiya mêrê xwe derxisti  
bû,

lê nizanî bû ji ber çî ye. Ji wexta ko hati bû bi kesekî re ne axifî bû.

Digel

ko diya hênik bû bû jî ew hêj di hundur de bû. Nûrê di dilê xwe de  
dig-

ot; »Hewaleke vî mêrikî heye!... lê ka çi?...«  
Dunya bû bû êvar, wexta xwarina şîvê bû. Nûrê sifre amade kiri bû;  
gi-  
rar tev xisti bû leganekê û goşt jî danî bû ser. Lê Gemşo hêj ji odê  
derneketi bû. Dûre Nûrê çû hundur ko gazî bikiyê da were şîvê  
bixwe.  
Gemşo li hundirê odê, li ser tejikekî, serê wî li ser balgihekê  
ramedandî,  
difikirî. Nûrê; »Çi hewala te ye? Çima tu wusa bêkêf î? Xwedê neke,  
qey  
tu nexweş î?« pirsî. Gemşo, hinekî bi xeyd; »Na! Ez ne nexweşim;  
dev ji  
min berde!« got. Nûrê hinekî bi tirs; »Ez xwarina te binime vir?«  
got. Lê  
Gemşo; »Na! Dilê min nuha naçiyê; pariyekî ji min re hilîne.« got.  
Nûrê bi şûn de vegeriya cem zarokan; lê çi bibîne! Herdu zarokên  
biçûk, bi kevçiyên xwarinê dikin ko serê hevdu bişkênin. Her yekî bi  
alijekî zimanê mîhê girtîye û bi alî xwe de dikişkişînin. Ew dibê;  
»Ziman  
para min e!« û yê din dibê; »Na, ya min!...« Eger ko diya wan ne  
goti  
bûya; »Ziman para bavê we ye!« dê şerekî mezin di navbêna  
herduyan de  
derketa. Lê wexta ko gotinên diya xwe bihîstin; dev ji hevdu berdan  
û  
dest bi kevaştina herdu lingên mîhê, ko para wan keti bû, kirin.  
Gemşo heta ko dunya tarî bû di hundur de ma. Lê vî çilê havînê,  
germ



û wexma hundir ne dihat debar kirin. Dûre rabû ser xwe û çû ser  
ban, li  
ser nivînan xwe dirêj kir.  
Nûrê bi dû ko sifre da hev û zarok tev kirin xew ew jî hate li ser  
nivînan,  
li tenişt mêrê xwe rûnişt. Gemşo jî paldayî cixarek pêxisti bû, hêdî  
hêdî lê  
bi hilmên dirêj dikişand. Nûrê xwe ne girt û pirsî; »Ev îro bo çi tu  
wilo bê  
kêf î?« Gemşo zîvirî ser pîreka xwe, awirek tê veda; »Ma ez dê  
çawan bi  
kêf bim, ma xelk dihêlin!« Nûrê; »Çi karê me ji xelkê xera bû ye?«  
Gemşo  
keserek veda û hinekî bi qehr; »Dê çawa çi karê me ji xelkê xera  
dibe?  
Çavên xelkê bi vê pariya nanê ko em dixwin bar nabe!« Nûrê; »Çi  
bûye?  
Qey te û hinekan rahiştiye heve?« Gemşo hilmeke dawîn li cixara  
xwe  
xist, qunka wê bi erdê ve perçiqand, paşê; »Ev segbavê Ehmedo; ev  
serê  
mehekê ye li dû çawîşê qereqolê digere ko qesabiya qereqolê ji min  
bistîne. Îro jî girûzak pakêtên “samson” di dest de hate cem çawîş  
û pis-  
tepista bû wî pê re diaxifî.«  
Wexta wusa got, madê Nûrê bi carekê guherî. Ev serê salekê bû  
rewşa

wan ya aborî bi qesabiya ko mêrê wê ji qereqolê re fikir hinekî pak  
bû bû.

Gemşo ê heftê rojekê biçuya ji leşkeran re pezek bigura û heqdestê  
vî karî

8

jî dê ser û hûrê pez bigirta.

Berê ji du mehan carekê goşt dixwarin an ne... Lê nuha li ser sifra  
wan

her heftî goşt peyda dibû. Sifra wan bi karê qesabiyê hinekî  
dewlemend

bû bû.

Li gund ji du cot erdê wan pê va tiştê wan yê din tune bû. Herdu  
cotên erd jî debaran wan ne fikir. Herweha serûpêyê ko mêrê wê  
dihanî,

her ji du heftiyên carekê difrot gundiyên din û bi van peran jî  
kêmasiyên

xwe wekî din dibuhurandin. Bi kurtî, ji bo wan qesabiya qereqolê  
gelekî

girîng bû. Ji dest derketina vî karî malxerabî bû. Li dunyayê hertişt  
dibû

lê ev yeka ê neba!

Nûrê bi dengekî nîvxenîqî: »Tu çel Ehmedê me yê Fatimê dikî?«

Gemşo; »Na, na! Ev ji gundê Çavnebarê ye. Ne weke me feqîr e jî;  
zêdî

du sed donim erdê wî jî heye.« Nûrê; »Weyla şeş top li malê keto!...

Digel

ko xwediya evqas zevî ye, hêj çavên wî li hatina serûpêyekî pez e  
jî...« got

û di dilê xwe de hezar nifir lê kirin.

Heta derengî şevê jî herdu li ser nivînan dirêjkirî, hişyar bûn. Dûre ji hejmartina stêrkan çavên Gemşo westiyan, bêhemdî xwe xilmaş bû  
û di

xew re çû. Nûrê jî bi dû mêrê xwe de bi saetekê, ew jî bi zor di xew re çû.

Tiştên ko Nûrê di xewna xwe de dîtî pir tevlihev bûn: Gelek caran li

cem zarokan û hinek caran xwe li cem mêrê xwe didît. Carekê jî li ser

kaniyê wexta ko serûpê paqij dikir; kûçikek bi dizî dihat, serê xwe dikire

teştê, serê mîhê dikir nava diranên xwe û direvand. Nûrê wexta ko didît

kûçik serî direvîne, wê jî nemerdî ne dikir, dawa xwe dikir devê xwe û rast

dida dû... Kûçik ew li nava gund tevî digerland. Dûre wexta didît Nûrê ji

dû venagere; berê xwe dida qelêç û direviya lê wê jî dida dû. Di xewna

xwe de heta berbanga sibê Nûrê her li dû kûçik bû. Sibehî wexta ji xew

rabû bû, ew jî li xurtbûna xwe ya şeva din ecêbmayî ma bû!

Lê xewna ko Gemşo dît pir zelal bû; Gemşo wê rojê ji paleyê dihat. Gelekî birçî û westiyayî bû. Li vegeerê, pîreka wî serûpêyê ko Gemşo doh

anî bû malê, çêkiri bû. Nûrê sifrê li ber mêrê xwe amade dike. Gemşo tu

kêmasî di sifrê de ne dîtîn. Serê mîhê yê kelandî li ser legana miştgirar bû.

Herdu ling û ziman jî li dora serî bûn; Nûrê pîvaz û nan jî ji bîr ne kiri bûn, ew jî danî bûn ser sifrê. Wexta ko Gemşo sifre wusan dît, av bi de-

vê wî ket û bi lez destê xwe dirêjî serûpê kir. Lê destên wî çûn valahiyê.

Sifre, fena ko yek ji ber bikişîne bi dûr diket. Gemşo, bi qûnkişkê bi dû

sifrê de çû. Lê ew çiqasî ko diçû sifre hîn bêtir bi dûr diket. Gava ko serê

xwe bi jor de kir, çi bibîne! Ehmedo ye yê ko sifre girtiye û ji ber direvîne.

9

Ehmedo tevî sifrê di derî re ji hundur derket. Gemşo jî da dû; lê li devê

derî leşkerekî singuwa xwe dixist sînga wî û ew paşde didehfand.

Gemşo

bi piştê ve li erdê ket û ji xew çemd bû.

Wexta ko Gemşo hate ser hişê xwe dît ko ji ser nivînan gindirîye erdê.

Gemşo rabû ser xwe eşheda xwe anî, wê çaxê fam kir ko pir birçî bûye.

Rast çû merkeb hilda, xwarina ko pîreka wî jê re hilanî bû xwar.

Sibehî, Gemşo pîreka xwe şand dikana Çelo ko girûzak pakêtên “sam-

som” bîne. Nûrê li mêrê xwe nerî û got; »Kuro! Girûzak pakêtên

“sam-

son” dinyake pere dike! Tûtina te heye tu çima wê nakişînî?«  
Gemşo serê  
xwe hejand; »Keçê tu dîn î! Ez ê çawan pakêtên “Samson” ji xwe re  
bikir-  
im! Ma ez axe me, an jî milyonên min hene! Heftiya ko bê ez ê ji  
çawîşê  
qereqolê re bibim ka bê hinekî dilê wî xweş nakim, ji bo qesabiyê ji  
dest  
min dernexe.«  
Berî ko Nûrê di derîyê hewşê re derkeve, Gemşo li pey qêrîya; »Ku  
Çe-  
lo bixwaze, di bedêla pakêtên wî de em ê serûpeyêkî bidinê; tu  
wusa jê re  
bibê.« Nûrê; »Ez kefilê te ko wê qayîl bibe û ko em bixwazin, ew ê  
di ser  
de hinek pere jî bide me. Serûpeyek hêja ye du girûzên pakêtên  
“sam-  
son”.« got û çû.  
Heftîkê şûnde, roja çarşembê bi berbanga sibê re Gemşo ji xew  
rabû.  
Limêja xwe kir û xwe girêda ko biçe qereqolê. Ev roja gurandina pez  
bû.  
Bi parîk nan û tasek av xurîniya xwe şikenand û girûza pakêtên xwe  
xiste  
bin çengê xwe û riya qereqolê girt.  
Bi meşê ji gund heta qereqolê nîv saet digirt. Gemşo gavên xwe  
mezin  
kirin û lezand; diva bû dereng nemaya.

Gemşo zû gihişt qereqolê. Wexta di deriyê hewşê re derbas bû  
hundurê  
bexçê qereqolê dudilî bû. Nema dizanî bû ew ê pêşiyê biçe cem  
çawîş  
pakêtan bidiyê, an biçe karê xwe xelas bike û dûre here cem... Hêj  
wusan  
diramiya, ji nişka ve dengekî ew di cihê wî de ricifand. Gemşo ev  
deng zû  
nas kir; wexta dikir pez serjê bike ev denga dibihîst. Ev barîniya  
mîheke  
ko ew ê serjê bibûya. Bi alî koza ko pez lê digurandin ve baz da;  
wexta ko  
gihişt nêzîkî kozê di cihê xwe de mat ma! Çi bibîne! Leşkerekî mîh  
girê-  
daye û li ber sekinî ye. Ehmedo jî berdilka qesabiyê ko hêj bîhna  
xwêdana  
Gemşo jê ne çûye, li xwe kiriye û kêr di dest de bi mivredê tûj dike.  
Ehmedo dema ko Gemşo dît, beşîşî û bi alî mîha dikire maremar ve  
çû.  
Dema ko Gemşo dît yek bi hêrs, bi ser de diqîre hate ser hişê xwe.  
Çawîş li ber rawestî ye û bi tirkî dibê: »Tu ker Bûye! Ev çar carin ko  
ez  
bang te dikim.« Gemşo, bêyî ko awirên xwe ji ser Ehmedo û mîhê  
10  
dagerîne, ji çawîş re got; »Min bibexşîne begê min! Min dengê we  
ne bi-  
hîst.« Çawîş girûza pakêten "samson" di bin çengê Gemşo de dîti  
bû.

Çawîş; »Kuro! Bi xwedê tu merivekî merd î. Tu naxwazî di bin qenciya kesekî de bimînî.« û bêyî ko Gemşo pakêtan bidiyê wî bi xwe destê xwe dirêj kir, girûza pakêtan ji bin çengê wî derxist. Çawîş; »Te ev ji bo min anî ne, ne wisa?« Gemşo; »Belê, min ji we re anî...« Lê hêj gotina xwe xe-las ne kiri bû, Ehmedo kêr da qirika mîhê. Destên Gemşo bêhemd çûn ser qirika wî; te digo qey Ehmedo ne qirika mîhê, ya wî dibire. Gemşo xwest ji çawîş re tişteki bibê lê çawîş ji wir bi dûr keti bû. Nema dizanî bû dê çi bike? Hertîşt vekirî bû; ji îro û pê ve Ehmedo qesabê qereqolê bû. Tiştê ko bi tenê hate bîrê, ev bû ko ji wê derê berî deqeyekê bi dûr bikeve û wusan jî kir. Bi riya malê de Gemşo ne dixwest ko tişteki bifikire, lê deynê Çelo, yê pakêten »samson« her li bîrê bû.

11

Bavfile

Eva demek bû ko pirika malê bêhal bû. Dilê wê yê ko heftê salan bêwes-

tan lêxisti bû dida xuyakirin ko êdî westiyaye û vê vatiniyê nema dikane

bimeşîne. Pirikê ji xelkê malê xwest ko cihê wê li ber pacê çêbikin.

Mîna

wan jî dizanî bû ko pirika ixtiyar rojên xwe yên dawîn dijî, ji ber vê jî hemû xwestinên wê bi cî dihanîn û cihê wê vê gavê li ber pacê, li oda jorîn

çêkirin.

Dîsa li ser xwestina wê, oda jorîn ji qerebalixa zarokan û çûnûhatina mêvanan mehrûm hişti bûn. Di oda dengmirî de, pirîka ixtiyar tena serê

xwe li gel raman û bîreweriyên jiyana xwe ya derbasî bû.

Ruhstênê ko leza wî hebû, li dorhêla malê diçû û dihat. Her ko derî vedibû çavek li hundur digerland, dinerî ka pirika ixtiyar amade ye ko

ruhê xwe teslîm bike an...

Lê dema didît ko pirîka ixtiyar bi bîreweriyên jiyana buhurî ve meşgûl

e, fersendek didayê, ne dixwest wê nerihet bike û dîsan bi paş de vedi-

geriya.

Dibên dema ko mirov diçe ser heqîya xwe, beriya ko ruhê xwe teslîm

bike, hemû jiyana xwe bi bîr tîne. Jiyana meriv mîna şerîteke filîmê sîne-

mayê di ber çavên meriv re derbas dibe.

Lê eva ji bo pîrika ixtiyar ewçend ne hêsan bû. Wê ê li filîmê kîjan



jiyanê bimeyizanda! Jiyana wê ya eslî jê dizî bûn. Heta dehsaliya  
xwe ew

jiya bû. Ew deh sal li ocaxê bavê, li gel xweng û biran, ehl û dostan,  
bi

germiya evînê û dostaniyê bihurandi bû. Hê jî dema ko difikirî,  
germiya

evîniya wê jiyanê li canê xwe hîs dikir. Dengê dê û bavê di guhên wê  
de

olan dida: »Marya... keça min, xwe zû girêde, em ê biçine dêrê! Em  
dereng nemînin... nuha ayînê dest pê kiriye!« Wê gavê ê Marya  
kincên

xwe ên xweşik li xwe bikirana û li gel dê û bav, xweng û birayên xwe,  
riya

dêrê bigirtana. Dengê jama dêrê ji dûr ve dibihîstin, ev îşareta  
destpêki-

rîna ayînê bû. Lê xem ne dikir, dereng jî bimana ew ê dîsan biçûna,  
li

nav dost û merivên xwe, cihê xwe bigirtana, paşê jî guhdariya  
metrên

bikirana.

12

Wê demê Marya zêde tiştek ji gotinên metran fam ne dikir, lê dîsan  
jî

beşdarbûna ayînê li xweşa wê diçû. Li wir hemû hevalên xwe  
didîtin. Dêr

jî avahiyeke mezin û bilind bû. Hemû bi heykel û wêneyên pîrozwer  
xemilî bû. Li beramberî xelkê, li ser dikek hinekî bilind û fereh, xaçek  
ke-

virî û mezin bilind dibû û bi xaçê ve jî heykelê Mesîhê xaçkirî,  
dardekirî  
bû. Ji herdu dest û lingên wî yên ko bizmar tê de kuta bûn, xwîn  
diherikî,  
herweha ji kêlekek wî jî xwîn diherikî. Marya çîroka Mesîh dizanî bû,  
ji  
ber ko li malê jî dê û bavê wê eva kat dikirin: Mesîh lawê Xwedê bû;  
mî-  
na mirovekî hati bû dunyayê. Wî xwesti bû, gotin û heqiya Xwedê  
pêşkêşî mirovan bike û bi vî babetî mirovan ji zilm û zordariyê azad  
bike.  
Lê mirovan jê bawer ne kiri bûn, helbet ne hemûyan. Yên ko jê  
bawer kiri  
bûn jî hebûn; donzdeh hewarî û wekî din jî hin mirovina baweriya  
xwe  
pê anî bûn. Lê yên mîna Herodos û Pontus Pîlatus pê bawerî ne anî  
bûn,  
evana jî mirovên bi qewet, paşe û general bûn. Li ser daxwaziya wan  
jî  
Mesîh ko lawê Xwedê bû, mehkeme bû bû û hati bû kirin. Paşê  
jî ew li xaçê xisti bûn. Hecar bavê wê; »Erê!« digot. »Ew bû qurbanê  
gunehkariya mirovan, wî xwe kire qurban, ji bo ko Xwedê me efû  
bike!«  
Bavê wê jê re ;»Marya!« digot »Me navê diya Mesîh li te kiriye.  
Navekî  
pîrozwer e.« Lê nuha, mîna gelek tiştên din ev nav jî bû bû xewneke  
şe-

van. Ev şêst sal bû ko ev nav bi kar ne anî bû. Neviyên wê, pirika Emînê

jê re digotin û wisa gazî dikirinê. Emîne jî navekî pîrozwer bû, lê eva ne

ji bo mesîhiyan, ji bo misilmanan wisa bû.

Gerçî, navê Emîne ew ji mirinê xelas kiri bû, lê nuha dema ko difikirî, têdigihîşt ko bi vî navî re gelek tişt jî winda kiribûn.

Dibên “Zeman hemî birînan derman dike!” Lê eva ji bo pîrika Emînê derbas ne dibû. Di dawiya temenê xwe de, ji nû ve bû bû zarokek.

Ew

Marya ko şêst sal berê di hiş û dilê xwe de veşarti bû, serê xwe derdixist û

dibişirî. Marya evîndar ko mîna çîçekek nûbişkuvî bû, girti bûn û hilqe-

tandi bûn; ji dar û erda wê kiri bûn. Lê nuha ji nû ve dixwest bibişkuve,

ji nû ve dixwest bibe Marya. Ê vêca ew ê tu kesî rê li ber ne girta, ne ax-

ayên kurd yên zalim û ne jî leşgerên osmanîyan!

Bi bîreweriyên Maryayê re birînen şêst sal berê jî ji nû de vedi bûn.

Eva

birînen dijwar bûn û di wexteke mîna şêst salan de derman ne dibûn, ji

bîr ne dibûn. Hê jî dema ko ew rojên fermana mezin bi bîr dihanîn, di-

cirifî, ecêbmayî bû û hiş û aqil ne dida mekruhî û barbariya mirovan!

Mirovên ko cîranê wan bûn, ewên ko di bajarekî de, li kolanekê bi salan

li gel hev jiya bûn û ji hev re digotin; »Krîvo!« û »Krîvê!«; di rojên fermanê

13

de gelek ji wan bû bûn mîna gurên devbixwîn û êrîş dibirin ser wan, ew

dikuştin û talan dikirin. Belê ev ne karê mirovan bû, ev ne karê aqilan

bû...

Lê birîna giran, êşa ji hemûyan mezintir, windakirina dê û bav, xweng

û birayan bû.

Di wexta fermana mezin de bû: Rojekê dîsan famîlya wan hemû li gel

dost û merivên xwe, li dêrê civiya bûn. Metran wazên xwe kiri bûn.

Di

nav wazên metrên de tenê gotinek dihate bîra wê. Eva ji Incîlê bû, Mesîh

goti bû; »Ji dijminên xwe hez bike!« Paşê jî koma zarokan dest bi kilamên

dînî kiri bû, distiran. Marya jî gelek caran beşdarî vê komê dibû. Lê nuha

tu kilam bi bîr ne dihanîn, ji xwe ji wê rojê û vir de qet tu kilam ne goti

bûn.

Hê koma zarokan kilama xwe didomand, dema dengê şawşawekê nêzîkayî li dêrê dikir. Zarokan dev ji kilamê berda bûn, hemû mirovên di

hundurê dêrê de, mîna ko dîzanî bûn ew ê çî biqewume, komî ser  
hev  
dibûn. Çend ixtiyaran li hemberî heykelê Mesîh îşareta xaçê  
derdixistin  
û due dikirin. Metran ji cihê xwe radibû, ber bi deriyê dêrê diçû û ji  
yên  
hundur tika dikir ko bêdeng bin. Lê ji nişka ve deriyê dêrê bi  
şingeding  
vedibû û komek leşker û zîlamên kumsor, bi çek û rextan pêçayî,  
êrîşî  
hundur dikirin.  
Metranê ko li ber derî, li ser kabokan ji wan tika dikir, derba pêşin  
xwari bû! Paşê jî dest bi yê din kiri bûn; bi sunguyan û guleyan!...  
Mîna  
gurên birçî bûn, kerîyekî pez bê xwedî û bê şivan dîti bûn! Dawî ne  
di-  
hat, ne diqediya, ta ko deng ji hemûyan bilîya bû. Diya Maryayê ew  
hemêz kiri bû, xwe avêti bû ser, ew ji sunguyan parazti bû. Marya,  
bê-  
deng û behîti bû. Xwesti bû biqîre lê nikanî bû. Dîmena li ber çavan  
ew  
lal kiri bû, matmayî bû!  
Di nav cendekên mirovan re li jor, li xaça bilind ya kevirî meyizand.  
Ji  
dest, ling û kêleka Mesîh xwîn diherikî; lawê Xwedê ji nû ve li xaçê  
xisti  
bûn!  
Piştî demekê kalemêrek hati bû hundurê dêrê û bi xemgînî weşeta

hundur keşif dikir. Hinekî şûnde jî Marya qidûmşikestî û matmayî li paş xaça kevirî didît. Bi dilovanî destê xwe dirêjî wê dikir. Marya bi şik û dudilî destê xwe didayê. Kalemêr jê pirsî bû;»Navê te çi ye?« Wê bi cir- ifîn; »Maa... Marya!« goti bû. Kalemêr hinekî fikirî bû û; »Baş e, Marya, guh bide min!« goti bû. »Ji nuha û pê ve, navê te Emîne ye! Viya ji bîr meke, kî ji te bipirse tu ê wisa bersivê bide!« Paşê jî ew biri bû mala xwe.

14

Li mala kalemêr, ji pîrejina wî pê ve keseke din tune bû. Ji wê rojê û vir de, Marya bû bû keça kal û pîra misilman û navê wê Emîne bû. Emînê weke keçek misilman, ders û edeba misilmaniyê girti bû û di hivdehsaliya xwe de jî ghişti bû mêrekî misilman, pê re zewucî bû. Ji vê zewacê jî Xwedê sê law û du keç dabûnê. Emînê jiyaneke bê bela û bê nexweşî bihurandi bû û ghişti bû temenekî giramgîr, mîna heftê salî. Lê çendî ko ji kesekî re behs ne kiri bû û xwesti bû ji bîr jî bike, dîsan bîrew- eriyên jiyana Marya ew berneda bûn. Nuha di rojên xwe ên dawîn de jî ji nû ve bû bû Marya! Lawê wê, yê mezin mîna ko ne dixwest diya xwe ya ixtiyar, di saetên

dawîn de tenê bihêle, loma jî her serî gavekê dihat, li ber serê wê  
rûdinişt  
û pê re mijûl dibû. Carekê jî dema jê pirsî bû ko tu xwestinên wê  
hene,  
wê gavê diya wî çavên xwe ên giranbûyî heta nêvî vekiri bûn û bi şik  
li  
lawê xwe meyizî bû. Lê dîsan jî bi hêviyekê, ji lawê xwe tika kiri bû  
û goti  
bû; »Min bigire bibe dêrê! Ez dixwazim li dêrê metranekî bibînim!«  
Wê  
gavê lawê wê bostekê ji erdê bilind bû bû! Û nemimkuniya vê  
daxwaziyê  
xwesti bû ji diya xwe re kat bike.  
Paşê jî ji xelkê malê re goti bû ko; »Diya me xurufîye!...« Bi dû de jî,  
xelkê malê biryar dabûn da biçin melayekî bînin ko li ser çend fatîhe  
û  
yasînan bixwîne!  
Lê Maryayê fam kiri bû ko tiştêkî nemimkun ji lawê xwe xwesti bû  
û  
herweha ne dixwest ko guhdarî li tu fatîhe û yasînan bike. Ji ber vê  
jî ruh-  
stênê ko li ber derî ecele fikir, vexwandi bû hundur û ruhê xwe  
teslîm kiri  
bû.  
Dema mele ghişti bû ser, êdî dilê Maryayê rawesti bû, nema  
lêdixist.  
Mela êdî hewce nedî ko tu yasînan li ser bixwîne, tenê fatîheyek  
xwendi

bû û bi paş de vegeriya bû.

Dema mela çû bû, lawê wê xwesti bû laşê diya xwe rast bike. Gava destê

wê yê girtî ji ser sînga wê bilind kiri bû, bi ecêbmayî, çavên wî bi xaçeke

piçûk û zêrîn keti bû ko dibiriqî, rahişti bû xaçê, nêzîkî çavên xwe kiri bû,

bi behîtmayî nivisa li ser xwendî bû;»MARYA«

15

Dilê dê

Li quncikekî odê rûnişti bû û teşîya xwe dirist. Lê hiş û bala wê li ser aliyê

din yê odê bû. Li wir, li ber têna agirê sobê, li bin lembeya gazê, ko hun-

durê odê nîvronî fikir, rûniştibûn. »Bexê« wê, belê wê hercar lawê xwe

wisan bi nav fikir, jê re »Bexê min!« digot. Bi bavê xwe re sohbet fikir.

Ev serê çend mehan bû ko ne hati bû malê. Li bajêr xwendekar bû, lê

her meh ew ê carekê bihata gund û bavê xwe zîyaret bikira, tişt û xwarin

bi xwe re bibira û dîsan vegeriya bajêr. Lê her sê mehên dawîn qet ne hati

bû û kesekî jî salox jê hilneda bûn. Ji bajêr jî saloxên naxoş gihişti bûn

gund. Goti bûn; »Xwendekar û polîsan li hev dane!« Neba ko »Bexê« wê



jî di nav wan de ba? Wê jî zor dabû bavê da biçê bajêr »Berxê« wê bibîne

li hal û rewşa wî bipirse.

Beriya heftiyekê bû; hêj bav wisan di haziriya çûyîna bajêr de bû dema

ko »ewana« hatibûn. Eva elameteke ne baş bû. Bi cemseyekê hati bûn, bi

qasî sîh kesî bûn û hemî jî bi çek û rextan pêçayî. Dora xaniyê wan girti

bûn û qul bi qul li hundur geriya bûn. Paşê jî bav girti bûn çend buks û

şeqam pê va kiri bûn rebeno bêhal li erdê dirêj bû bû. Paşê jî bi berstika

wî girti bûn û jê pirsî bûn; »Lawê xwe derxîne! Em dizanin ko tu wî vedişêrî û eger tu ne kal ba me ê tu li şûna lawê te bibira!« goti bûn û hezar

gotin û çêren nexweş jî jê re kiri bûn.

Wê xwe gihandi bû serokê cendirman û jê re; »Efendî, ji bo çi hûn li lawê min digerin? Ma çi kiriye? Lawê min xortekî gelekî delal û dilbirehm e. Eger hûn wî binasin ê kêfa we gelekî jê re bê!« gotibû. Lê serokên cendirman dehfek dabûyê û bi hêrs, bi tirkî axifî bû. Wê tenê

gotina ko »Lawê te terorîst e!« fam kiri bû. Lê ji vê gotinê jî mana »Terorîst« nizanî bû. Ew jî çi bû? Lawê wê hêj xwendekar bû û tu dibis-

tanên bilind ne qedandi bûn. Lê ji vê bêja »terorîst« wisan xuya dikir ko

cendirme pir aciz bûn.

Paşê ji bavê pirsî bû; »Terorîst çi ye?« Wî jî; »Yên ko li hember dewletê

radibin û berberiyê bi polisan re dikin« goti bû.

»Ji bo çi?« pirsî bû. »Lawê me ê çima bi polisan re berberiyê bike?

Ji bo

16

çi ew û dewleta Elî Osman ê têkevin pêxîla hev?« Lê bavê jî baş nizanî bû.

Gerçî vê sala dawîn hin guhertinên li ba »Beroxê« xwe dîti bûn.

Gelekî

behsa feqîrî û Kurdistaniyê dikir. Dayê digot; »Wê wextek bê... ê welatek

ava bibe û hemû kes ê weke hev bin. Neheqî ê rabe!« Wê jî goti bû;

»Beroxê

min, tu behsa dema ko Mêhdî ê rabe dikî. Eva di quranê de jî heye.

Wê

gavê ê gur û mih bi hev re biçêrin!« »Beroxê« wê; »Na, dayê ez ne behsa

Mêhdî dikim. Vî welatî em ê bi xwe ava bikin. Gelek welatên wisan jî li

dunyayê hene.« goti bû.

Îşev hati bû malê, ew jî bi dizî hati bû. Dema ko çû bû dewaran êm bike, ew dîti bû. Li hewşê li ber sêncê bû; »Dayê, dayê...« goti bû.

Dengê

»Beroxê« xwe zû nas kiri bû. »Beroxê min tu î... li ber vê sermeya zivistanê

tu çawan disekinî? Tu ê nexweş bikevî dilê diya xwe!« goti bû û ew himêz

kiri bû û anî bû hundur.

Bav jî behîti ma bû dema ko ew dîti bû. Lê tişte li xwe çê ne kiri bû.

Dilê bavan qewî ye, ne mîna yê dê tenik e. Mîna ko tiştê »Bexê«

wê kiri

bû ne ecibandi be; »Te dît bê te em xistin çî pirikê! Dijminaya

dewletê ji

me re zêde bû!« goti bû. Paşê jî çû bû, çifte û rextê xwe derxisti bû,

li ber

pacê rûnişti bû û; »Ji sed bavê xwe bê minet in, bila werin!« goti bû.

Teşîya xwe dirist, lê bala wê li ser »berxikê« wê bû. »Çî zeîf bû bû...

diya

te bi qurbana te be lawo!«

Ew jî çî bû? Bavê şîret lê dikirin û behsa deverna dikirin. »Binxetê,

ba

hevalên xwe...« »Bexê« wê ê bi kû de biçuwa, bi kû de biterqiya...

Teşîya xwe berda û hat li ba »berxê« xwe rûnişt. »Lawo tu ê bi kû

de

biçî. Li malê bimîne, diya te ê herşev nobedariyê li te bike. Ka em

biner-

in ê Xwedê çawan bike.«

Lê di gotin û cidîyeta »berxê« xwe derdixist ko ew ê biterqiya. Ê ne

ci-

hekî nêzîk jî; ê sînor jî derbas bikirana. Xerîbî zehmet bû, derdê

xurbetê

giran bû. Ji xwe li ser talûkên bi rê de ne dixwest ko bifikire. Bi rê de

cendirme, mayîn hebûn û viya jî xof dixiste dilê wê ew ditirsand.

Bavê rahişti bû çifte û rextê xwe û derketi bû, li dor xênî digeriya,

harisî

dikir. Beriya ko derkeve jî; »Lawê min tu ji xwe re rakeve, ez bavê te me,

ez nahêlim çivîkek jî nêzî mala me bibe. Berê sibehî jî ez ê te ji xewê rakim« goti bû.

Herdu li hundur bêhnekê wisan bêdeng man. Tenê vizîniya bayekî xurt dihat û di terkên ber pacê û qelşên di dîwêr re êrîşî hundur dikir.

Dema wisan bi heyranî û evînî li lawê xwe temaşe dikir, bêhemd gilorîkên wê hati bûn xwarê. Lawê wê; »Dayê megrî, tişteke tune, tişt 17

nabe, ez ê vegerim!« got.

»Li diya xwe negire, lawo. Dilê hemû diyan bi ser lawan ve ye. Kî dizane bê bi çi keşkûliyê heta meriv lawekî mezin dike, bi firê dixê û paşê

jî...« got. Di vir de xwest ko rewşê jê re kat bike, lê wê; »Na, lawo ez dizan-

im, fam dikim. Min bi çavên xwe ewana dîtin. Agir ji devên wan dibariya, fena kûçikên har bûn. Na lawo xwe neke destê wan, bêbav in!«

got.

Di vê navbênê de bav jî keti bû hundur; »Vê sermayê, çivîk jî li der nikanin rawestin!« got û hat dîsan li ber pacê cihê xwe girt.

Hinekî şûnde diya wî çû bû odeya mêvanan, cihê »berxê« xwe edilan-

di bû; »Beroxê min, nivînên te min danîne, rabe ji xwe re hinekî rakeve.«

got.

Piştî ko »berxê« wê çû oda din û raket, herdu bi tenê ma bûn. Bav  
li ber

pacê bû û awirên xwe ji ser riya tirmpêlan ko dizîvirî gund qut ne  
dikir.

Ew jî li quncikekî odê rûnişti bû û lihêfek heta nêvî kişandi bû ser  
lingên

xwe. Li hundur bêdengiyeke mirî hakim bû. Bi hev re ne dipeyvîn,  
lê di

serê herduyan de jî eynî tişt derbas dibû.

Ew ê ji lawê xwe yê bi tenê cuda bibana. Lawê ko kî dizane bê bi çi  
keşkûlîyê mezin kiri bûn û dabûn xwendinê. Ji bo wan ji viya  
zehmetir

tiştêk nikanî bû bi serê wan de bihata. Ji hêvî û sitûna mala xwe  
dibûn.

Diya wî xwe bi xwe tinaz dikir û digot; »Xwedê mala sebeban xira  
bike!...«

18

Rabû ser xwe, rûnişt, bi zendika xwe çavê xwe paqij kir. Ji bêrîka  
xwe

heste derxist, vêxist û li saetê nerî; 3 nîşan dida. Hêj zû bû, ji  
avaçûna ro-

jê re gelek vext diva. Xwe bi xwe: »Çar pênc saetên din, di vir de ez  
ê

çawan debar bikim?« got. Rastî jî wusan bû! Ne dihat debar kirin.  
Her ko

wext derbas dibû jî, bîhna hundurê şikeftê genî dibû.

Wê rojê dengên ko nêzî şikeftê bihîsti bûn ew mecbûr kiri bû ko  
pêwis-

tiyên xwe ên însanî jî di hundur de bike. Viya jî bîhnek tûj zêdetir  
genî li  
hundurê şikeftê belav dikir. Herçendî mîna pisinga ew bi axa hundur  
û  
kevira veşarti bû jî, dîsan ji xwe re rêyek didît û bîhna xwe ya tûj  
genî  
digihand qulên pozê wî.  
Vê bîhnê êşek dijwar xisti bû serê wî, ew dewixandi bû, gêj kiri bû û  
her  
xewa wî dihanî. Mîna ko eva ne bes be, ramanên dijwar jî ji hêla  
xwe de,  
li pey hev êrîşî serî dikirin û nerehetî didanê. Lê ji neçarî ew diva bû  
li  
benda tarîtiyê bima. Nikanî bû dev ji şikefta xwe berda, ew şikefta  
ko  
keleh û sitara wî bû! Nikanî bû xwe şanî rokê bikira, xwe nikanî bû  
bisi-  
parta wê stêrka mezin ko qisûr û kêmasiyên tu kesî venedişart. Ji  
xwe ji vê  
hêlê de jî gotin jê re tune bû! Gelek caran wî xwe bi xwe digot:  
»Jiyana  
min bi qisûr û gunehan ve tijî bûye; lê ev guneh û qisûr hemî min li  
şexsê  
xwe bi xwe kiriye û eva bi salan min domandiye; ez li hemberî xwe  
gunehkar im!« û paşê jî dilê xwe bi xwe dişewutand û gazî dikir:  
»Ax!  
Xwedayê tarîtiyê, Gurê Manco tu li kû î! De were min merivê neçar,  
bi

tenê, bigire bibe... tenê tu dikanî di nav baskên xwe ên tarî de min nependî bikî... tenê tu dikanî min ji gelac, fitne û çavsoran veşerî!« digot.

Serê xwe dîsan danî ser »balgihê« û xewê jî pêre mîna perdeyeke tenik

xwe bi ser de girt. Hêj wusan deqeyek ne qediya bû; ji nişka ve rabû, rûnişt. Rahişt meterê xwe yê avê, devê wî vekir û jê av vexwar. Te digo

qey bi vî babetî ê xewê ji ser çavên xwe birevîne. Lê xewê her zorî didayê;

ew bû bû mîna dapîra wî ko di zarotiya wî de, di wan şevên dirêj ên zivis-

tanan de dihat her şev li ber serê wî rûdinişt, jê re çîrok digotin ta ko di

xew re diçû. Lê çîrokên ko nuha bi bîr dihanîn û di serê wî de vêdiketin,

19

mîna yên dapîra wî bi xweşî û serfirazî ne diqediyên. Evana bîreweriyên

jiyana wî ya dijwar bûn, çîrokên bextreşî û tenêtiya wî bûn, bîreweriyên

xwîn û xwêdanê bûn!

Xwe ramidand ser teniştê xwe ya rastê, bi enîşka xwe palda ser balgihê

û destê xwe ji serê xwe re kire sitûn. Piştê çavên xwe li tarîtiya hundurê

şikeftê gerand. Di niqteyeke tarî de awirên wî bê mane kom bûn û wu-

san ma. Hinekî şûnde jî êdî nema dizanî bû ko hişyar e, an di xew de ye.

Lê hişê wî bi bûyerên jiyana buhurî ve tijî bû. Dema ko hişyar bû ev bûyer wekû bîreweryiê dijwar bi bîr dihanîn û dema ko radiket jî evana

dibûn xewnên naxoş...

Merivê bi derd û tenê hergav bi xwe re di muhakemê de ye; ji ber ko ew

piştî demekê fam dike ko nikane jiyana xwe ya buhurî bi tevayî ji bîr bike.

Tenê tiştê di destê wî de dimîne ko car bi car li derbasiya xwe vegere û

bi vî babetî qencî û gunehên xwe şirove bike. Ji ber vê jî dema ko bûyerên

derbasbûyî bi bîr dihanîn, êdî zor li hişê xwe ne fikir ko wan ji bîr bike.

Xwe bi herka bireweriyan ve berdida û bi xeyalatên kesên wan re careke

din mijûl dibû û ew bîrewerî ji nû ve dijiyan. Nuha jî hişê wî bi bûyereke

wusan meşgûl bû:

Dawiya payizê bû, rojê ewrîn bi ba û baran bû dema ko hevaleyê hati

bû ew ji mal girti bû û dibir edreseke nenas. Tenê jê re goti bû; »Hevalê

berpirsiyar dixwaze te bibînî!» Wî gelekî nav û dengê »Hevalê berpirsi-



yar« bihîsti bû. Digel ko ew ne dîti bû jî, mîna ko ew nas dikir  
xeyaleta wî  
li ber çavên wî bû. Hevalê berpirsiyar wusa bê sedem bangî tu kesî  
ne  
dikir, bêguman eva karekî girîng e! Ji demeke dirêj ve jî ew li hêviya  
va-  
tiniyeke girîng bû. Viya ê him qîmet û rûmeta wî di nav hevalan de  
bilind  
bikira û him jî mecalên kar û xebata ji bo dawê zêde bikira. Ji ber ko  
wî  
gelekî baweriya xwe bi vê dozê anî bû û bi her babetî dixwest ko ev  
doz bi  
pêşkeve.  
Li kolanek ko ji deng û gumeguma bajêr hinekî dûr bû, di deriyekî  
re  
ketin hundurê hewşeke fereh. Di hewşê re derbasî hundurê  
salonekê  
bûn, ji wir jî jinikek kin û bi cilên navmalî bergirtiya wan bû û deriyê  
odeyekê nîşanî wan da.  
Ode bi şeweyekî basî û kurdî raxistî bû. Hevalê berpirsiyar li ser  
doşekê sînger, li quncikekî odê rûniştî û pala xwe dabû balgihekê  
û  
pirtûkek di dest de vekiri bû û dixwend. Dema ko derî vebû bi  
hêdîka  
serê xwe rakiri bû û bi beşîşîn li wan nerî bû. Paşê jî pirtûk ji dest  
xwe danî  
bû û bi giramî ji cihê xwe rabû bû û xêrhatin li wan kiri bû. Ew li  
hêlekê

20

û yê pê re jî li hêleke din ya hevalê berpirsiyar rûniştibûn.

Hevalê berpirsiyar pêşin li halê wan pirsî bû û paşê jî bi şêweyekî kurt

agahdarî di derheqê dozê de dabû wan, goti bû ko: »Doza me ya pîroz-

er heroj gêş dibe û ghiştiye xwegihîneke nû. Dijminê me yê xedar ji bo

ko vê dozê bifetisîne bi her babetî êrîşan tîne ser me û em jî divê ji bo vê

yekê amade bin. Bivê nevê, divê em şerê xwe bi şêweyekî çekdarî jî bidomînin. Beriya hertiştî jî divê em caş û xayînên nav xwe ceza bikin!«

Wî û yê din bi her babetî rastiya li paş gotinên hevalê berpirsiyar dişiki-

randin. Paşê jî li ser pirsê hevalê berpirsiyar wî di derbarê navçeyê de hin

agahdarî da.

Piştî vê agahdariyê hersê bêhnikê bêdeng ma bûn. Paşê hevalê berpirsiyar berê xwe dabû wî û bi beşîşîn jê re; »Dozê biryar girtiye ko tu

ê li vî navçeyî bibî berpirsiyar û koordînatorê me!« goti bû. Hevalê berpir-

siyar di çend saniyan de ev gotin goti bûn, lê ji bo wî çend deqe girti bûn

ta ko fam bike. Xwest ko bersivekê bide lê nizanî bû ê çi bibêje, tenê soro-

moro bû û di cihê xwe de xwe livand. Lewra qîmet û rûmeta ko dozê di-  
dayê, piştî vê fam dikir û bi viya re gelekî kêfxweş û serfiraz bû. Lê dû re  
fam kir ko divê çend gotina bibêje û; »Ku dozê ez laqî vê vatiniyê dîtîme,  
tu gotineke min jê re tune. Eva ji bo min serfirazyieke mezin e û heta  
ko ji min bê ez ê laqî vê vatiniyê bim.« got.  
Di wê navbênê re jinika malê li derî xisti bû û bi tepsînek ko sê îstikên  
çayê li ser, keti bû hundurê odê. Wexta ko dest bi vexwarina çaya xwe kiri  
bûn, hevalê berpirsiyar nameyek derxisti bû û hêdî hêdî çavê xwe lê di-  
gerand, paşê berê xwe dabû wî û; »Eva jî biryareke din ya dozê ye û divê  
di hundurê mehekê de bê halkirin û dozê xwestiye ko tu bi xwe viya or-  
ganîze bikî« got. Bi dû de jî name dirêjî wî kir ko lê binêre. Wî name girt  
û çavê xwe lê gerand, dema ko çend rêzên pêşin xwendin heyecanekê bi  
laşê wî girt lê hewl da ko vê heyecana xwe veşêre û her ko rêzek dixwend  
serê xwe mîna erê dilivand. Li dawiya namê jî îmzeyên hevalên ko hebûn  
zêde bala wî kişand:

»Li ser navê dozê;

Heval !!

Heval ??

Heval \*\*«

Paşê dîsan name şûnde da hevalê berpirsiyar û wî jî li ser tepsîna çayê

agir berda nameyê. Piştî ko name şewutî û bû arî, hevalê berpirsiyar dest

bi axaftinê kir û; »Hûn vî caşî nas dikin û ji xwe rûniştevanê bajarê we ye,

21

êdî tu wekû berpirsiyarê navçeyê hevaleyê maqûl peyda dikî û vê vatiniyê

didiyê« got. Bi dû gotina xwe de jî destê xwe kire bin doşeka singer, ji bo

vê vatiniya pîrozwer, demançeyek derxist û da wî. Wî rahişt demançê û

di destê xwe de qulupande vî alî û wî alî; malê belçîkî bû û lûleyeke wê î

dirêj hebû.

Hevalê berpirsiyar êdî karê xwe qedandi bû, berî ko wî bi rê bike; »Ez

îro ji vir diçim cihekî din; dibe ko heta demekê ez neyê vir lê ev hevala

ê li gel te di kontaxê de be. Bi riya wî tu dikanî bi me re têkiliyê deynî.«

got û xatir ji hevedin xwestin û ew bi rê bû çû.

Di riya malê de hişê wî her bi vî »Hevalê maqûl!« ve meşgûl bû. Di  
hişê  
xwe de lîsteyeke heval û dostên dozê ên navçe çêkir û xwest ko vî  
»Hevalê  
maqûl« hilbijêre û biçê vê demançeyê bidiyê û jê re bibê; »Aha,  
keko!  
Rahije vê demançê û ji kerema xwe re biçê vî merivê xayîn bikuje!«  
Lê,  
fam kir ko wusan ji nav meselê dernakeve û dev ji lîsteyê berda; lê  
biryar  
girt ko hemû hevalan sibehê li cihekê bicivîne.  
Rojtira din, ber bi êvarê her serê çend deqeyan deriyê mala wî lê  
diket  
û hevalek an du heval derbasê hundurê odê dibûn. Hevalê dawîn li  
dor  
saet heftan keti bû hundur û civînê dest pê kiri bû.  
Ji xwe hemû hevalên dozê ew berê jî wekû berpirsiyarê navçe  
dizanîn û  
bi wî çavê lê dinêrîn. Di vir de guhertina ko bû bû, ev bû ko ev  
vatiniya  
wî êdî fermî bû bû.  
Wî civîn vekir û di derheqê dozê de agahdariyek kurt da hevalan,  
paşê  
jî; »Doz bi pêş ketiye:« got. »Ev yeka ji hemû hevalan fedekariyên  
nû  
dixwaze. Divê heval ji vatiniyên nû re jî amade bin!« Lê ev gotinên  
dawîn

helbet bi qesteke din ve goti bûn, lewra dema fam kir ko bi vî babetî  
vê

vatiniya nû ê nikari be bi hevalan bide fam kirin axaftina xwe birî.

Çû

pirtûkek ji dolaba xwe derxist û da hevalekî ko bixwîne û yên din jî  
lê

guhdarî bikin. Eva ne cara yekem bû ko wusan dikirin; her serê çend  
ro-

jan ê li malekê biciviyana û bi hev re pirtûkên li ser ilmê Marksîzmê  
bixwendina. Ev pirtûka jî yek wusan bû; ya diroka partiya Bolşewîk  
bû.

Ji ber hevalên berpirsiyar herdem digotin ko; »Ji bo em bikari bin  
şoreşekê li welatê xwe darxîn pêşin dive em di derbarê şoreşên  
welatên

din de agahdar bin.«

Ew li quncikekî odê rûniştî bû û mîna hemû hevalan li diroka partiya  
Bolşewîk guhdarî dikir. Lê di heqîqetê de helbet ne wusan bû, serê  
wî bi

tiştêkî din ve mijûl bû û yek bi yek hevalên li odeyê rûniştî di ber  
çavan

re derbas dikir.

22

Xwe bi xwe: »Misto, Reşo û Nûro ji xwe zarok in û ji vatiniyeke  
wusan

re nabin. Silo, Miheme û Şikrî jî nû têkilî danîne ew jî nabin. Şêrgo ê  
jî

berê biçe ji diya xwe bipirse û Heznî jî zêde mirovperwer e evan jî  
nabin!«

Fam kir ko tu kes ji nav hevalan ji bo vê vatiniya pîrozwer ne amade ye.

Çend dostên ko derî vê civatê bûn jî ji binî de ji bo karekî wusan ne maqûl bûn. Viya hinekî dilê wî şikenand û fikrên naxoş kirin serê wî. Lê

heta ko civat rûniştî bû tiştêk li xwe dernexist û dilşikestiya xwe bi hevalan neda xuyakirin.

Dema ko civat belav bû xwe gelekî bêhal û neçar hîs dikir; çû li ser nivî-

nan xwe dirêj kir û xwest ko ji vê kabûsa ha hişyar bibe. Lê eva ne tu xewn

û kabûs bû, lewra rastiyeke bû û wî bi kar, tewr û baweriyê xwe gihandi bû

vê rastiyeke. Ji dîroka xwe ne bêxeber bû, dizanî bû ko di riya dozê de mirov

ê werine kuştin. Helbet fikra ko ê rojekê ew bi xwe bi tiştêkî wusan ve be-

ramberî hev bibe ne kiri bû. Lê çî dibû, di vê riyê de meriv guh li daxwazên şexsî ne dikir. Menfaetên raya giştî, ên xelk û welêt di ser her-

tiştî re bûn û wî bi xwe jî digot; »Eva divê wusan be«. Dizanî bû ko wekû

ferdekî bi tenê xwe nikanî bû di ser dozê re bigirta, doz ji her kesî û her-

tiştî mezintir bû. Xwe bi xwe; »Piştî ko wusa ye, meriv ji bo dozê dikane

bibe hemû tişt, ko pêwist be heta qatil jî!« digot. Bi dû ko raman û argu-

mentên wusa hinekî xwe bi xwe minaqeşe kirin, dijitiyên di serê wî  
de  
kêm bû bûn û di xew re çû bû.  
Sibehî dema ko ji xewê rabû bû, zû taştiya xwe kiri bû, xwe girê dabû  
û  
derketi bû der; ji xelkê dost û nas bi babetekî ko tê dernexin,  
agahdarî di  
derheqê vî merivê xayîn de sitandi bû. Piştî heftiyekê jî êdî dizanî bû  
li kû  
rûdine ji xwe kar nedikir, diçe kîjan qehweyan, li kû digere û danûsi-  
tandinên wî bi kê re hene, hemû tiştên di derheqê wî de ko jê re  
pêwist  
bûn hîn bû bû. Bi dû vê de jî, heroj demançeya wî di berde, li  
kolanên ba-  
jêr, li dû vî merivê xayîn digeriya ko li xewleciyekî keysê lê bîne û wî  
bin-  
erd bike, bikuje.  
Lê, mîna ko pêşiyên me gotine, »Gotin û kirin nabe yek« û viya di  
vir  
de rastiya xwe bi hemû babetî beyan dikir. Lewra her ko fersend  
dikete  
destê wî nêzîkayî lê dikir ko dawiya vê vatiniya pîrozwer bîne, ew  
têdigi-  
hişt ko kuştina mirovekî çendî zehmet e. Ew mirov çî dibe bila bibe,  
ger  
xayîn be û kuştin jî heq kiri be dîsan ji bo wî ewçend ne hêsan bû ko  
nikilê demançê bikişîne û li hemberî xwe vî mirovî di nava xwînê de



bibîne. Ji bo vê hin tiştin zêdetir jê re diva bûn û eva li ba xwe wekû  
kê-

masî didîtin. Ji ber ko wî baweriya xwe bi vê dozê anî bû û ev doz  
bêyî

23

kuştin ne dibû, ev jî dizanî bû; lê ev şik û dudiliya ko li ba wî çê dibû  
ge-

lo ji bo çî bû, aqil ne didayê!

Rojekê, dîsan bêyî ko tiştê kiri be vegeriya bû malê, li paş derî  
kaxizek

dîti bû, li ser kaxizê; »Were wê edresa ko me cara dawîn hevdu dîti  
bû.

Heval M!...« nivisî bû. Eva ji sîxurê dozê pêve ne tu kesekî din bû.

Bêyî

ko derbasî hundur bibe dîsan derî li dû xwe girti bû û rast riya wê  
edresê

girti bû.

Dîsan li wê odeya kevn yê sîxur bi serê xwe rûniştî dîti bû, xêrhatin  
li

hev kirin û paşê li teniştê wî rûnişt. Heval M. dest bi axaftinê kiri bû;

»Gelek silavên hevalên dozê li we hene, ez doh ji ba wan hatim.

Hevalê

berpirsiyar bi karên din ve meşgûl bû an ne ew jî dihat« got. Paşê jî  
pirsî;

»Ka, ew kara tu deng jê derneket, heval meraq dikin. Ger pêwîstiya  
we bi

alîkariyekê hebe heval amade ne. Heta xwestin ko hevalê vî karî  
bike jî ew

bişînin!« got. Lê wî; »Na!« got. »Pêwîstiya me bi tu tiştî nîne, ev  
kara di  
wexteke nêzîk de ê bibe, tenê silav û giramiyên me pêşkêşî hevalan  
bike!«  
Lê hinekî şûnde mane neda van gotinên xwe yên dawîn. Cara din jî  
de-  
ma ko ev vatinî qebûl kiri bû dîsan wusan kiri bû û paşê fikirî bû ko  
ji bo  
çi ev kara girti bû ser milê xwe. Xwe bi xwe; »Ev cara pêşin e ko doz  
karekî  
wusa dide ber min ko ez ji viya re jî bibê m na, wê gavê karê min li  
cem  
wan çi dimîne?...« got. Lewra wî baweriya xwe bi dozê dihanî û di  
viya de  
tu şik jê re çênedibû, xwediye vê biryarê jî doz bû, wî ê tenê nikilê  
de-  
mançeyê bikişanda û ji viya re jî tu hunereke zêde ne diva.  
Wexta ko ji heval M. xatir xwesti bû û derketi bû der dunya tarî bû  
bû,  
ji dêlva riya malê, riyeke din girt û hêdî hêdî meşiya. Hinekî şûnde  
gihiştî  
bû kolaneke dirêj, bêdeng û nîvtarî. Çend roj û şevên berê di vê  
kolanê re  
gelekî çû bû û hati bû û vir ji bo karekî wusan cihekî bêhempa didît.  
Ji  
ber ko goriyê wî jî hercar di vê kolanê re derbas dibû, diçû mal. Hêj  
wusa

dimeşiya û ji nişka ve deng li paş xwe bihîstin. Wî, çi dibe û çi nabe dig-  
ot û bi şevê dema ko li vê kolanê digeriya, ne dixwest ko kesek wî bibîne  
û nas bike; ji ber vê jî hinekî lezand, li qucikê dîwarekî bilind, li ber konteynekê xwe veşart.  
Du zilam bi hev re dipeyvîn û hêdî hêdî ber bi wî dihatin. Qederê bîst  
metreyan jê dûr dîrekekî ceryanê hebû, yek ji wan çend lambeyên ko li  
kolanê vêdiketin jî bi vî dîrekî ve bû. Dema ko herdu zilam ghiştin ber  
şewqa lembê, wî li wan temaşe kir û xwest wan li ber şewqê bitefsilîne. Ji  
nişka ve mîna ko yek sîtilek ava sar bi ser de bike ji cihê xwe çemd bû. Ji  
ber ko yek ji zilaman, bi qama xwe ya kin, serê xwe yê girover, enîya 24  
vekirî, porê paşde şehkirî û bi berçavk ji goriyê wî pêve ne tu kesekî din  
bû. Çendî ko nêzîk jî dibûn, dengê wî jî nas dikir; mîna yê serxweşan qalind bû. »Na lo! ho ho ho... te çawan ew... ho ho..« digot. Ji xwe bi xwe  
re; »Nuha û ne careke din!... ji vî cî û vê wextê baştir fersendeke din nakeve destê min!« got û destê xwe avêt qebza demança siwarkirî û li  
hêviya wan ma.

Herdu zilam bêyî ko hayê wan ji bayê felekê hebe axaftina xwe  
dido-  
mandin û rast ber bi wî dihatin, ji xwe riyeke din ko tê re biçin jî  
tune bû,  
ê her di teniştê re derbas bibûna.  
Wusa di wê rewşê de fikirî ko ew ê çend derba berdiyê û li kîjan  
alîyê  
laşê wî... »Ji bo serê wî derbek bes e! Lê tarî ye, dibe ko ez derba  
pêşin  
birevînim. Lê, ko ya dudiyan jî min revand... na, ez ê berdim sînga  
wî...  
dudiyan, na sisiyan... deng... yê pê re... nuha û ne careke din!«  
Herdu zilam, bêyî ko hayê wan ji bayê felekê hebe, sohbeta xwe  
dido-  
mand û hêdî hêdî di kolana nîvtarî de ji ber çavên wî bi dûr ketin,  
wun-  
da bûn. Ew di cihê xwe de matmayî rawesti bû û destê wî yê rastê  
hêj li  
ser demançê bû. Ji ber xwe demançe ne kişandi bû û nikarî bû  
bikişanda;  
ji ber ko demança nîvkîlo mîna pêncsed kîloyan giran bû bû û mîna  
ko  
yekî ji paş wî ve ew hişk bi herdu destan girti bû, ji cihê xwe nikanî  
bû  
bilivîya û digel ko ew dûr keti bûn jî hêj kabokên wî diricifîn.  
Hinekî şûnde riya malê girti bû û dimeşiya, lê li ber xwe keti bû, hêrs  
bû bû û ji xwe şerm dikir. Xwe bi xwe; »Heyvanê cegerê bi min re  
tun-

eye, ez merivekî bizdonek im!« digot. Di rê de difikirî ko sibê biçe  
ba  
hevalên dozê, demançê bide wan û bibê; »Ez merivekî bizdo me, bi  
kêrî  
tişteki nayê û ne layîqî we me!« û bi vî babetî destê xwe ji hemû  
karê  
dozê bikişîne.

Dema ko ghiştî bû malê ev fikra li cem xurtir bû bû û biryar da ko  
sibê  
bi rastî jî biçe wusa bike. Piştî vê biryarê mîna ko barekî giran ji ser  
milê  
wî rabû be xwe rehet hîs dikir. Wexta ko xwe li ser nivînan dirêj kir  
ko  
rakeve jî tu fikrên naxoş û kabûsan ew nerehet ne dikir. Pêre pêre  
mîna  
zarokekî zû di xew re çû bû.

Sibehî dereng ji xewê rabû bû, taştiya xwe kiribû û ber bi nîvro ve  
rahiştî bû demançê kiri bû ber xwe û ji mal derketi bû ko biçe biryara  
xwe  
ya şeva din bi cî bîne. Tu şik û dudiliya ko biryara xwe paşde bigire,  
li ba  
wî çê ne bû bû.

Ji dêlva ko kolan û kolan mîna hercar biçe wê edresê, vê carê rîya  
sûkê  
girt û çû. Li nava sûkê, li xaçerêyekê dema xwest ko derbasî aliyê  
din bibe

mirovêkî ko xwe li qapûtê xwe pêçaye û dixwaze xwe ji barana ko nû dest pê kiriye biparêze bala wî kişand, dema ko pêrgî wî bû, dît ko goriyê wî yê şeva din e. Xwe bi xwe, bi beşîşîn; »Dua bike, şensê te heye ko tu şeva din ji nav lepê min xelas bûy!» got. Bi dû de jî di ser milê xwe re hinekî lê nerî. Yê din li kêleka xaçerêyê derbasî hundurê dikanekê bû bû. Xaçerê derbas kiri bû û çend gavan şûnde diket kolanekê, lê derbasî kolanê ne bû û paşde vegeriya. Xaçerê paşde derbas kir û ew jî derbasî hundurê wê dikanê bû. Dikan ne fereh lê dirêj bû, ji xeyn goriyê wî yê şeva din du mişteriyên din li dikanê bûn. Jinek û mêrek li ber kêsekî fasûliyan rawesti bûn û jinikê destê xwe xisti bû nav kîs û mîna ko dixwest bala mêrê xwe bikişîne, bibê; »Ev ne baş in!« Lê bala mêrik li jor li ser refkê, li tiştêkî din bû. Goriyê wî jî rahişti bû çaydanekî û bi xwediyê dikanê re bazar dikir; »Na lo... bi Xwedê eva li ba hecî Umer arzantir e!« digot. Lê wî bi dû ko hinekî çavên xwe li tiştên hundurê dikanê gerand û di bin çavan re hinekî jî li goriyê xwe yê şeva din meyizand, xwest ko derkeve. Hêj ne gihişti bû ber derî, yê dikandar li dû qêrîya; »Pismam, ma

tiştêk ji were pêwîst bû?...» got. Ew li dû xwe vegeriya û; »Na, sipas!« got.

Lê di wê gavê de awirên wî û yê goriyê wî bû bûn yek. Û ji nişka ve destê

wî çû bû ser demançê, ji ber xwe derxisti bû berê wê dabû wî, gaveke din

jî ber bi wî avêt û sê derb li pey hev di singa wî de berdand. Tu deng ji yê

gorî derneketi bû, çaydan ji dest keti bû û çend saniye şûnde jî bêruh li

erdê, li ber lingên wî dirêj bû bû. Tenê yê dikandar behîtmayî; »Na...na!«

diqêrîya.

Ji cihê xwe çemd bû, mîna ko li derveyî şikeftê dengina dibihîst. Di viya

de jî ne şaş bû, yekî; »Na, na... were vira ew kete hundurê vê kuna ha!«

digot. Paşê jî çend dengên din lê zêde dibûn û nêzîk dibûn. Xwe bi xwe;

»Çi kete hundurê vê kuna han! Li vê derê ji şikefta min pêve tu kun tunene« got û paşê jî çavên xwe li tarîtiya hundur gerand. Li quncikekî

dema du çavên beloq ko dibiriqîn dît, wê gavê rahişt çeka xwe û berê wê

da wî alî. Lê dûre fam kir ko nikane di hundur de wê biteqîne, dengê ko

jê derketa ê guhên wî ker bikira. Wusa çek di dest de xwe nêzîkî mehlûqat

kir ko fam bike bê çî teba ye. Ji lebt û dengê wî têderxist ko roviyek e.

Rovî xwe di quncik de asê kiri bû û rabû bû ser herdu lingên dawîn û bi

lepên pêşin jî xwe diparast. Her ko wî nêzîkayî lê fikir irîniya rovî zêde

dibû û ji êrîşê re xwe amade dikir.

Dengên li derveyî şikeftê fesaltir dibûn wusa xuya fikir ko sê nêçîrvan

bûn û tajiyeke wan jî hebû, ji ber di nav dengên mirovan re kazekazek jî

26

dihat. Hinekê şûnde yekê ji wan; »Em tajî berdîn...« got. Lê yekê din; »Na,

wê rovî tajî birîndar bike!« got. Yê sêyemîn; »Em agirekê di kunê de bikin,

wê gavê ê rovî derkeve!« got. Dema ko ev gotin bihîstin xwe nêzîkî rovî

kir û; »Aha, eva xirab e birakê rovî. Divê yek ji me derkeve der an ne em

ê herdu jî ji dûyê di vir de bifetisin!« got. Paşê jî bi lûla tivinga xwe xwest

rovî daf bide. Lê rovî mîna ko dixwest bibê; »Vira ne cihê şer e!« irîniyek

ji xwe anî û bi lez çû alîyê din î şikeftê, lê heta ko jê hatibû xwe dûrî qula

ko derdiket der digirt; ew alî fereh dihişt mîna ko jê re bibê; »Kerem bik!



Çima ne tu?»

Çend caran wusa wî û rovî di hundurê şikeftê de hevdu birin û anîn  
lê

yekî zora yê din ne bir! Çi rovî bû, bi hemû tewrên xwe dida famkirin  
ko

qet dilê wî û derketina der tune ye! Dema ko wî dengê şikandina  
daran

bihîst fam kir ko wexta wî hindik maye. Dev ji rovî berda tiştên xwe  
berhev kirin, ber bi cihê derketinê çû û di qulê re bi zikişkê derket  
der.

Tajî û nêçîrvanên ko li hêviya rovî bûn, dema dîtin ko ji dêlva rovî ve  
zilamek bi rext û tvingê pêçayî ji kunê derket der, behetmayî man,  
qêrîn

bi wan ket û ji wir reviyân.

Dunya esra dereng bû, germiya tîrêjên rokê kêmbû bûn û rok li ber  
aveçûyinê bû. Ji cihê xwe ko hinekî kaş bû, xwe ber bi newalê ve  
berda,

berê xwe da çiyayekî bi dar û devî, li aliyê din î newalê û lezand.

Dema ko ghişt binê newalê, dengê bihist. Yekî ji nêçîrvanan bi  
dengê bilind ji hevalê xwe re digot; »Ew ne rovî bû, bû!...«

Gotina li newalê olan dida, car bi car dibû: »,

« mîna ko ne dixwest vî dengê bibihîse herdu destên xwe danîn  
ser guhên xwe û di nav devîyan de ji ber çavan winda bû.

27

Ez û heykel

Em li ber heykelekî civiya bûn. Heykel, li qiraxa golê, li ser erwazekî  
bû.

Em deh kes bûn; pênc keç, ji bilî heykel em pênc kes jî mêr bûn.  
Wusa  
dixuya ko heyîna heykel, ji min pê va bala kesekî din ne kişandi bû.  
Belkî  
jî ji ber ko ez bi tenê biyaniyê wê derê bûm, loma...  
Ne dihate famkirin bê heykel temsîliya çi dikir. Tu nivîs li ser hîmê  
wî  
ne dixuya. Dibû ko heykelê qehremanekî bû... Lê tu diruvê  
qehremaniyê  
jî pê ne diket! Şipya bû, lingên wî yên ji hev ji bo gavavêtinê amade  
bûn.  
Gopalê di dest de ko bilind kiri bû, ji daristana hemberî me pêve tu  
dev-  
er nîşan ne dida. Bîrhên wî mîna hejikên ser sêncê bel bûn. Bêvila  
wî ya  
mezin dîmena dev û ruwê wî yê nelihev bêtir xera dikir. Qama wî  
ne kin  
û ne jî dirêj bû. Lê dîsa jî hîmê wî yê ji mermer dida xuyakirin ko di  
wex-  
ta xwe de bi qedir û qîmet bûye.  
Me sifra xwe li tenîştê heykel danî bû. Lewra ji wê derê, me bi  
hêsanî  
dîkarî bû li golê û şînahiya daristanê temaşe bikira. Bi rastî cihekî  
ewqas  
xweş bû ko meriv dîkarî bû li wir rûniştê û di rojekê de çend şîir jî  
binivisiya.  
Min piştê xwe dabû hîmê heykel. Pêşiyê min got qey bi gopalê di  
destê

xwe de gefta li min dike, ez jê tirsiya bûm. Lê dûre min xwe bi xwe;  
»Ma

meriv qet ji heykelekî jî ditirse!« got û pala xwe da hîmê wî.

Ro di aso de hêdî hêdî diçû ava, şûna xwe bêdil ji tava hîvê re dihişt.

Li

jor ezmanekî bêewr, ji stêrkan xemilî û li xwarê jî xweşikbûna  
xwezayek

ko bi bêjan ne dihat teswîrkirin...

Me him ji fêkiyê ser sifrê ditamand û him jî şeraba xwe hêdî hêdî  
vedixwar. Gerçî nizamî çima, lê min hinekî bi pît vedixwar!

Dawiyê yekî ji me şekirek dişkand! Dest pê fikir ji mijarên romantîk  
ddipeyivî. Behsa hewayê kir; di wê bêhnîkê de te digot qey ji bo ko  
ax-

aftina wî romantîktir bike, di ser me re pêlik bayê hênîk derbas bû.

Wî

axaftina xwe berdewam fikir, bi rengekî gelekî xwezayî gotina xwe  
ji ser

hewayê guherand ser cemedê. Lerzekê ji sermayê bi me teva digirt!

Wî

piyaloka xwe hildida, gulpek ji şeraba xwe vedixwar, me jî pê re...

Wî ax-

28

aftina xwe bi katkirina çîroka H.C.Andersen ya bi navê »Xatûna  
Cemedê« didomand. Digot ko; »Yê sêrdar neynîkek efsûnî çêkiri bû.

Yê

ko di vê neynîkê de li xwe dinerî... li dunyayê hertişt xerab didît.

Dûre yê

sêrdar xwest vê neynîkê derxîne ezmên ko melek jî di wê de li xwe

binêrin. Lê neynik li ezmên hûr hûrî dibû û weke xweliyê dibariya xwarê.

Ew kesên ko piçek ji xweliya vê neynikê keti bû çavên wan, dest pê dikirin hertişt çewt û xerab didîtin.«

Dûre jî got ko kêfa wî mêrî gelekî ji vê çîrokê re tê. Dema ko weha got,

min gotina wî birî û digel ko qet pêwîst ne dikir, dîsa jî min got;  
»Kêfa

min zêdetirîn ji çîroka Keçika Kibrîtfiroş re tê.« Lê pêre pêre jî ez bi goti-

na xwe poşman bûm.

Serî tev fitilîn ser min, çavan teva li min nerî, komek guh xwe miç kiri

bûn û mîna ko bibên; »De bêje, vêca em li te guhdarî bikin!« Lê mixabin,

tiştêkî min î ko ez ji wan re bibêm tune bû. Ne zimanê min têrê dikir û

ne jî dilê min qîm dikir. Min ji herkesî bêtir dixwest ko ez guhdarî bikim.

Dema ko wan jî evaya fam kirin, dest pê kirin cot cot bi hev re axifîn. Yek

bi yek ji hev re navên çîrokên ko jê hez dikirin gotin. Wusa peyv dirêj dibû, ji mijarekî derbasî ser yekî din dibûn.

Mîna heykel, heyîna min î li wir jî zêde ne di bala kesekî de bû. Pêşiyê

li gor dilê min bû, kêfa min ji vê re dihat. Mîna nêrevanekî tenê bi çavên

xwe min civat dadiwerivand û di serê xwe de analîza şexsiyetên wan dikir.

Lê dûre ez ji vê vatiniyê aciz bûm û min xwest xwe bidim xuyakirin. Xwestinek ko bi hinekan re mijûl bibim li cem min çêbû ko êdî min nikarî bû rê li ber bigirta. Cara dawîn dema min bi awirên xwe civat daw-

erivand; li alîyê xwe yê çepê min keçek keşif kir. Du gavan dûrî min xwe

serî xwe bû. Yê din tev bû bûn zo. Ango yek nêr û yek mê...

Li wê derê ez, keçik û heykel mabûn. Li gor ko heykel bêgiyan, ji kevir

bû; ez û keçikê pişka hev diketin. Gava ko ez wusa fikirîm, tu sedem ji bo

ko neçim pê re nepeyivim min ne dît. Ji xwe dema ko wê jî carekê duduyan di bin çavan re li min meyizand, êdî ji bo axaftinê ez amade bûm!

Bêyî ko bizani bim ez ê çî jê re bibêm min hilda xwe ko herim cem.

Lê

bi hildana min re, ji nişka va pîhnek wusa bi pît li pişt min ket..

Dunya

li dora min zîvirî, kabokên min zîz bûn, min nema ber xwe dît, di cihê

xwe de ez kumişîm û bêhemdî xwe ez qêriyam!

Hemî fitilîn ser min û bi devekî gotin; »Çî bû?« Dema min serê xwe zîvirand, li paş xwe min ji heykel pêve tu kes ne dît; »Heykel pîhnek li

min da!« min got. Hemî bi min kenyan, teva; »Henekên te çiqas  
xweşin,

lo!« gotin.

Bi rastî li paş min ji heykel pêve tu kes tune bû. Dema min lê nerî bû  
ez

têghişti bûm ko lingên wî jî ne li cihê berê bûn. Gopalê ko di dest  
de jî

bilindtir bû bû. Çavên wî yên kevirîn bi awirên dijwar li min dinerîn.

Weke ko bibê; »Eger tu xwe hinekî din nêzîkî wê bikî, ez ê vî gopalî  
li serê

te bidim!«

Yên din zo zo rabûn li nava daristanê belav bûn. Li wê derê keçik, ez  
û

li paş min jî heykel mabû. Ji tirsê heykel bêyî ko ji cihê xwe bilivim  
ez

rûnişti bûm û difikirîm bê ez ê xwe çawan ji nav lepê vî heykelê  
çavnebar

xelas bikim! Keçik jî li cihê xwe rûniştî, goşîk tirî di dest de, jê dixwar;  
serê

gavê jî li min dinerî û dibişirî.

Teqnekî weha me li hev meyizand, dûre min biryar da ko rabim  
biçim

balê. Min piyaloka şerabê ya dawîn bi ser xwe de kir, hemû hêza  
xwe

civand û hinekî bi hêrs ez rabûm ser xwe. Lê bi rabûna min re pîhnek  
ji

ya berê bi deh caran hêztir li piştê min ket. Ez bi deverû ketim, li  
erdê

dirêj bûm. Hişê min ne çû bû, lê janekê wusa dijwar bi canê min tevî gir-

ti bû ko êdî min nikarî bû xwe bilivanda. Te digot qey qorika min bi der-

bekê re felişî bû. Weke ko bîhna min bi carekê çikiya be, deng û his ji min

dernediket.

Wusa dixuya ko keçikê tiştekan fam ne kiri bû. Ji dêlva ko were alîkariya

min bike, tiqetiqa wê bû bi halê min dikeniya. Evaya jî ji derba heykel

bêtir bi min zor dihat.

Nizanim bê li erdê ez çiqasî dirêj kirî ma bûm. Dema ko ez bi ser xwe ve hatim, yê din ji nava daristanê vedigeriyan. Tiştê ko bi serê min de

hati bû min ji wan re kat ne kir, ji xwe ew ê kesekî ji min bawer nekira.

Herweha keçikê jî behsa tiştekan ne kir. Lê gava ko çavên wê bi min diket

ew her dibişirî.

Şev dereng keti bû, êdî wexta çûyîna malê bû. Me firaxên xwe berhev

kirin û em bi rê ketin. Dema em ghiştin bajêr, me ji hevdu xatir xwest û

em belav bûn. Herkesî riya mala xwe girt, lê ez bi şûnde vegeyriyam cem

heykel.

Min çend fitil li dorê avêtin û min hezar çêr jê re kirin. Wî qet di xwe

dernedixist, mîna hemû heykelan ji cihê xwe ne diliviya, bêdeng û bêhis

bû. Di dilê xwe de min got; »Keçik ne li vir e, loma!« Lê min devjê berne-

da; ez çûm ser hîmê wî, min xwe dayê da wî bixim erdê. Qeweta min têrê

ne kir, min bi herdu destan bi gopalê wî ve xwe daliqand ko bişikênim lê,

30

ew jî ne şikest. Dûre min dît ko bi vî babetê ez ê nikari bim xisarekê bidimê, ez daketim, çûm ji perava golê min ber sînga xwe tijî kevir kir û

hatim li ber veketim. Lê wê jî xêr ne kir! Kevirên ko min davêtinê dîsa jê

dipengizîn, dihatin li binguhê min diketin. Min fam kir ko ji wî zêdetir

ez ê xwe birîndar bikim. Şev jî dereng bû bû êdî. Ji neçarî min kevir avêtin

erdê û pîs pîs reya malê girt...

Berî ko ez ji cem bi dûr kevim min jê re; »Tu qet nefikire ko ez ê wusa

dev ji te berdim! Ez nuha diçim lê bizani be ko ez ê sibê dîsan vegerim. Ez

dev ji te bernadim ta ko te ji ser hîmê te bigindirînim...« got.

31

Keçika piçûk

Wê sibê ew zû ji xewê rabû bû; dizanî bû ko diya wê nexweş e û ji nav



nivînan nikane derkeve. Ev serê çend rojan bû ko nexweş bû, şevtira  
din  
jî nexweşiyê lê kêr kiri bû, ev jî ji dengê nalînên wê fam kiri bû.  
Sibehî, wexta keçika piçûk ji xewê rabû bû xwe ji bo hemû karên  
malê  
amade didît. Ê bi rastî jî wisan bû. Ew gelek caran li gel diya xwe û  
pîrekên din bû dema ko wan kar dikirin. Wêya him alîkariya wan  
dikir û  
him jî li wan dinihêrî bê çawan kar dikirin. Ji ber vê jî gelek ji van  
karan  
ji nuha de ji ber kiri bûn; wek êmkirina heywanan, malajtina  
hundurê  
malê, pêxistina sobê û çêkirina şorba nîskan jî yek ji wan karan bû  
ko ev  
çend car bû xwe lê ceribandi bû û hema hema ew jî êdî bêqisûr  
dikir.  
Her sê karên pêşin digel ko ji bo keçikek heşt salî ewçend ne hêsan  
bûn  
jî dîsa bêqisûr û di wexta xwe de kiri bûn.  
Di vê navbêne de diya wê, mîna ko ne dixwest keçika wê ya piçûk  
zêde  
xwe biwestîne, xwesti bû ji nav nivînan derkeve. Lê ew hêj di nav  
nivînan  
de rûnişti bû û pêre pêre, ber çavên wê tarî bû bû, serê wê gêj bû  
bû û  
dîsan bi paş de keti bû.  
Keçika piçûk xwe zû bi diya xwe va gihandi bû; »Dayê! Ranebe ser  
xwe,

tu nexweş î. Ji xwe karekî ez zêde bikim ne maye. Tenê ez ê biçim  
ser  
kaniyê avinê bînim û şorbeyekê çêkim.« goti bû. Diya wê bi destê  
keçika  
xwe ya piçûk girti bû, bi heyranî û evînî lê nerî bû; »Delala min!... ko  
ne  
ji te ba halê min ê çî ba?« goti bû. Paşê jî destê xwe di ser porê wê  
yê ko  
hinekî bû bû gijik, re biri bû û »Eva sê roj in ko min porê te şeh ne  
kirîye!«  
goti bû. Lê keçika piçûk mîna ko bibê; »Xem nake!« bi diya xwe re  
bişirî  
bû, paşê jî şerbikê xwe li ser milê xwe kiri bû û rast riya kaniyê girti  
bû.  
Destpêka sibatê bû, lê dunya hêj sar bû; ewrekî tarî, ripûreş xwe bi  
ser  
gund de girti bû. Ji hewşan mareamra kahr û berxan dihat; li  
hewşekê ko  
berxek an jî kahrek bimariya, kahr û berxên li hewşên din jî dest pê  
dikirin dimariyan. Te digot qey bi vî babetî bersiva hevdu didan, li  
hev-  
du dipirsîn. Carina borîniya mangeyan û dewarên din jî tevî vî dengî  
dibû. Dengê hemûyan pevre bi meriv orkesreyek ko awazên cuda  
cuda jê  
32  
dertên bi bîr dihanî.  
Mala wan li çepê gund, li cihekî kêmxanî bû; ji ber vê jî keçika piçûk  
bi

riya kaniyê de pêrgî kesekî ne bû. Tenê qijalekê ko xwe li ser  
sêncekê danî  
bû; »Qij, qij!« qêriya û hat xwe li ser rê, li pêşiya wê danî. Keçika  
piçûk  
rahişt sixurekî û avêtê; »Bifire! Here bi riya xwe de, qijalka pîs!... tu  
çi  
dixwazî!« got. Lê qijalek firiya û çû çend gavan jê wir de xwe danî.  
Wêya  
dîsan rahişt sixurekî, avêtê, lê dema dît ko fêde nake, êdî hew guh  
da qi-  
jalekê.  
Dema keçika piçûk gihişte ser kaniyê, dît ko kanî zuwa ye, tu av ji  
lûla  
kaniyê ne diherikî. Kêlîkekê wisan mîna ko nizani be çi bike, şerbikê  
wê  
li ser milê wê bû û li hawîrdora xwe nerî. Di wê navbênê de qijalek  
hati  
bû xwe li ser koşeyeke dîwarê kaniyê danîbû û dîsan dikire qijeqij.  
Dema  
awirên keçika piçûk bi qijalekê ket, di serê wê de fikrek pêket.  
Keçika piçûk ji ba kanîyê bi dûr ket, lê ne riya malê, riyeke din girt.  
Wê  
biryar dabû ko ew ê bi şerbikê zuwa venegeriya malê. Wê dil hebû  
ko serê  
vê sibê ji diya xwe ya şêrîn re şorbeyekê çêbike, diya ko nexweş keti  
bû û  
nikanî bû rabe ser xwe.

Carina ko bi diya xwe re dihate ser kaniyê û dema ko didîtin kanî  
zuwa  
ye, wê gavê ev rê digirtin. Ji ber ko ev riya diçû ser sarincekê li aliyê  
din yê  
gund. Li wê sarincê ava baranê kom dibû û dema ko kanî ne diherikî,  
gundiyan ji vê sarincê av dihanîn. Nuha keçika piçûk jî riya vê sarincê  
gir-  
ti bû.  
Bi vê riyê de jî pêrgî kesekî ne bû, bi tenê ew û qijalek bûn, ji ber ko  
qi-  
jalekê hêj bela xwe jê venekiri bû. Her serî gavê dihat xwe li ser rê  
li pêşiya  
wê datanî. Carekê keçika piçûk ewqasî nêzîkî qijalekê bû ko xwest  
pîh-  
nekê lê xe, lê qijalek firiya bû.  
Sarinc ji ava baranê tijî bû bû; keçika piçûk dizanî bû ko gelekî kwîr  
e  
û viya hinekî xof xiste dilê wê. Lê wê dizanî bû ew ê çawan bike;  
mîna  
diya xwe hêdî çû ser neqebê û paşê jî hêdî şerbikê xwe xist nav avê.  
Bayê  
di şerbik de bi buqebuq jê derdiket û şûna xwe ji avê re dihişt.  
Keçika  
piçûk bi destekî bi kevirê neqebê girti bû û bi destê din jî şerbikê  
xwe yê  
ko tijî av dibû. Hêj wisan di vê rewşê de bû û ji nişka ve awirên wê  
çûn  
ser tiştêkî û viya bala wê kişand.

Li aliyê wê yê çepê çîçekeke hêşîn di ber kevirekî neqebê re serê  
xwe

derxisti bû û mizgîniya biharê dida. Lê viya di serê keçika piçûk de  
bîrew-

eriyek vêxisti bû.

Digel ko wê gavê hêj pênc salî bû jî ev bîrewerî weke îro bi bîr dihanî.

33

Wê çaxê bavê wê hêj dijiya. Gerçî nuha bavê wê li ezmanan bû;  
pêşiyê ew

li wir bû bû mêvanê kal û pîra wê û paşê jî ew ê xaniyek ji xwe re  
ava biki-

ra û li hêviya diya wê bima. Dema wê pîrsa bavê xwe dikir diya wê  
jê re

wisan kat dikir. Lê di vî warî de pîrsên wê gelek bûn û bi pîrsên xwe  
serê

diya xwe herdem gêj dikir. Diya wê gelek ji pîrsên wê dibersivand,  
lê ji bo

hinekan jî tiştek ne digot. Carekê jî dema ko pîrsek kiri bû diya wê  
hêrs

bû bû. Wê pîrsî bû; »Çima bavo paşde venagere, ma qey ji me hez  
nake?«

goti bû. Lê dûre diya wê jê re kat kiri bû; ko dema meriv çû  
ezmanan, ji

wir êdî meriv nema dikane bi paş de vegere. Lê helbet wê ê jî rojekê  
bavo

li ezmanan bidîta. Lê ne nuha ji bo wê gelek wext diva.

Keçika piçûk hêdî destê xwe yê çepê avêt çîçekê û ew ji ber kevir  
jêkir û

paşê jî serê xwe bi jor de kir. Li wir, li ezmên, li cihê ko bavê wê xaniyek  
ava kiri bû û li hêviya diya wê dima; xeyaleta bavê wê li ber çavên wê  
vêket. Weke wê roja biharê, dema ko ji çolê vegeriya bû malê, baqek  
çîçekên rengareng di dest de bûn û dibişirî. Wê gavê wê goti bû qey bavo  
ev çîçekana jê re anîne û gelekî kêfxweş bû bû. Lê bavo çîçek dirêjî diya  
wê kiri bûn; bi viya pir kêfa diya wê hati bû û bavê wê maç kiri bû. Lê ew  
hêrs bû bû û ta êvarî jî ji bavo xeyidî bû. Lê êvarî dema ko bavo jê re baqek  
çîçek anî bûn wê çaxê pêre li hev hati bû.  
Lê nuha bavo li ezmanan bû û nikanî bû vegeriya. Lê îro li şûna bavo wê ê ev çîçeka bida diya xwe, da hinekî be jî wê kêfxweş bike û paşê jî vê  
bûyera ko nuha bi bîr dihanî jê re kat bike.  
Di wê navbênê de jî şerbikê wê tijî av bû bû, buqebuq jê nema dihat û  
binav dibû. Keçika piçûk hewl da ko şerbikê xwe ji nava avê derxîne, lê ji  
ber ko destê xwe yê çepê ji neqebê berda bû, giraniya şerbikê tijî av, wez-  
na wê xera kir û ew bi pêş de kişand nava avê...  
Dunya sar bû, baraneke hûrik dest pê kiribû dibariya, ji nav gund maremara kahr û berxan dihat, ji bixêriyên xaniyan dixaneke hêşîn

derdiket û ber bi jor, ber bi ezmên bilind dibû. Qijalekê xwe li ser  
kevirên  
sarincê danî bû û mîna ko li hinekan hewar bike bi qîjeqîj diqêriya;  
lê  
keçika piçûk ji mêj ve mêvana bavê xwe bû.

34

Ken

Çûnûhatina bazara bajarê M.'ê pir zêde ye. Û herweha barkêşanî  
jî... Ji

berbanga sibê de heta derengiya êvarê ji mirov û tirumpêlan  
rêrêwanî di

bazarê de tune. Çûyîna ji alîyekî bazarê, heta bi alîyekî din ji bo  
mirovekî ko ne fêrbûyê vê derê be gelekî zehmet e.

Ji ber ko bajar li ser çiyayekî hatiye avakirin, bazar û kolanên wê pir  
teng

in. Ji bo ko meriv here ji dikanekê pakêtek cixare bikire, an biçe li  
aşxanakê

xwarinê bixwe, an jî bixwaze biçe qehweyekê çayekê vexwe; divê  
mirov di

derenceke bilind û dirêj re dakeve xwarê an jî bi jor de hilkişe.

Ev daketin û hilkişîna ji bo mirovekî destvala dîsan hêsan e. Lewra ji  
bo

barkêşekî ko 150200 kîlo giranî li ser piştê... bi rastî jî gelekî zehmet  
e. Lê

weke ko tê zanîn, zikê birçî li tu zehmetiyan meyze nake.

Digel ko her roj yek di van pêlikan re tevî barê xwe digindire tê  
xwarê,

an di bin pêçkên kamyonekê de dimîne, can dide, dîsan jî mirovên  
ko

barkêşiyê dikin roj bi roj zêdetir dibin û kêr nabin.

Wê rojê nizanim bi çi karî ez li bajêr bûm. Ji bo ko pakêtek cixare  
bistînim ji hotêla xwe derketim. Civatek mirovên ko li jêra  
derenceyeke

kevirîn li ser rê kom bû bûn, bala min kişand û nêzîkî wan bûm.

Tîtetîtê

tirumpêlan bû, ji bo ko derbas bin rê dixwestin lê xelk bi tiştêkî din  
ve

meşgûl bûn û kesekî guh ne dida wan.

Dema ko gihiştim cem civatê, ez rastî dîmeneke dijwar û berbat  
hatim,

ayy! ayyy! Ma meriv wisan li hevdu dike! Du barkêşan hevdu di  
xwînê de

hişti bûn. Bi çenqelên ko pê barkêşiyê dikin mîna ko meriv ji xwe re  
erdeki bi gîsin cot bike, wisan xetxetî ruwên hevdu qelişandi bûn.

Sê çar

xwedî xêr keti bûn navbêna wan ew navcî kiri bûn. Di wê navbêne  
de

polisek jî xuyanî bû.

Polîs pirsî:

Çi ye? Çi bûye? Ji bo çi hûn şer dikin?...

Herdu barkêşan destmalên xwe ji bêrîkên xwe derxisti bûn, pê  
xwîna li

ruwê xwe paqij dikirin. Ji herduyan yê ko hinekî bi emir û porşîn bû,  
dest

bi axaftinê kir:



35

Begê min, ezbenî!...

Kelogirî bû, weke mirovekî ko heqaret dîti be dipeyvî.

Ez mirovekî feqîr, jar, xwedî şeref û namûs im! Ez destûrê nadime tu

kesî ko henekê xwe bi min bike, bi min bikene... Berekî 150 kîlo li nav

milê min bi destê xwe telîsekî mezin î tijî firax rê da ez di vê derencê ve,

bi jor de hildikişîyam...

Di vir de, dengê wî kêmbû, fena mirovekî ko şerm bike axaftina xwe domand.

Ba ji ber min çû! got. Eva tiştê gelekî xwezayî ye. Lê ev yê ha barkêşê

li hemberî xwe nîşan da ji dêlva ko mîna mirovan bê bi min re alîkariyê

bike, barê min hilde... Erê ji dêlva... li paş min rawestiye û tiqetiqê wî bi

min dikene!... ko hûn bana we ê çi bikira?

Dema ko wisa got yê polîs sor bû û li dora xwe meyizand.

Barkêşê din bi hêrs:

Ez ê bikenim, got. Çiyê kê ji kenê min heye; haya min jî qet ji bayê te

tune bû... bayê ko ji ber te çû bû. Kenê min hat, ez kenîyam ewqas! Ma

qey qedexeye ko meriv bikene, kî dikare qedexe bike!... Aha, ez ê dîsan

bikenim!... got.

Paşê jî dest pê kir dengî ecêb ji qirika xwe derxistin. Lê ev ji ken zêde-

tir nalîna mirovekî birîndar dihanî bîra meriv: »Ho hoo, hee hee ih...«

digot. Pirqînî bi civatê keti bû. Lê barkêşê porşîn ji viya aciz bû, berê xwe

da yê polîs û bi dengekî jar:

Hîna jî dikene!... got.

Yê polîs bi çeplên herduyan girt û got:

Bimeşin! Li polîsgehê em ê vê doza we safî bikin...

36

Xewneke şeva zivistanê

»Jiyan ew e ko mirov xwe bigihîne der.« ev gotinên ramanwerekî ko di

pirtûkekê de xwendî bû bi bîr anî bûn, dema ko ji diskotekê derketi bû

der û hinek hewa paqij kişandi bû cîgerê xwe. Lê ne navê ramanwer û ne

jî navê pirtûkê dihat bîra wî. Û ji nişka ve hate bala wî ko navê dîskoteka

ko nuha jê derketiye jî ne li bîra wî ye. Lê hêj bi tenê çend gavan ji dîskotekê dûr bû û dikanî bû li paş xwe vegeriya, li jora deriyê dîskotekê

bineriya û lewheya ko bi wir ve dardekirî bû bixwenda. Lewra wusan ne

kir, bêyî ko li paş xwe vegere reya xwe domand.

Dunya sayî bû, lê rojtira din berf barî bû û nuha jî bayekî sivik, lê sar,

dest pê kiri bû. Lê wî li hember sermayê xwe baş pêça bû û cihê ko ew ê biçûwayê, istîgeha trêne jî ji wê derê ne dûr bû. Mîna ko bixwaze zû ji wê derê bi dûr bikeve dilezand. Lê li erdê bostek berf hebû, berf di bin lingên wî de diçû xwarê û ji bo ko neçerixê diva bû ko gavên xwe bi balkêşî bavêtina. Wexta ko li qiraxa mal û dikanên girtî re wusan li kolanê dimeşiya, li qorziya xaniyekî, li cihekî tarî bi zilamekî ve heramberî hevdu hatin. Zilam xwe ji ber da alî û paşê lê veşerîya, bi giramî; »Ezbenî, li pêşiya xwe binêrin wexta ko hûn dimeşin!« got. Lê qet li zilêm ne nerî û bersiv jî ne-da yê. Lewra serê wî bi gelek raman û fikrên din ve tijî bû û berî saetekê dixwest xwe bigihîne mal. Xwe bi xwe: »Mal!« got û beşî. Gotinên ramanwer ko li ber deriyê dîskotekê bi bîr anî bûn di serê wî re carek din derbas bû bûn. Dîsan xwe bi xwe; »Lê nuha ez mîna keftarekî berî deqeyekê dixwazim xwe bigihînim hundur, bêdengî û tenêtiyê!« got. Di vir de dijitiya li ba xwe fam dikir, didît û jê re beyan bû. Ji ber ko ewa gelek caran bi serê wî hati bû. Ji hundur, ji ber bêdengî û tenêtiyê dire-

viya. Wê gavê qelex û civata mirovan bala wî dikişand û li xweşa  
wî  
diçû. Lê dema ko tevî vê qelex û civatê dibû, wê çaxê jî ya din  
dest pê  
dikir. Bêriya bêdengî û tenêtiyê dikir û vêya jî ne dihişt û rê ne  
didayê ko  
xwe baş bi nava civatê de berde û bibe yekî ji wan.

37

Di gel ko hewl dida da çareyekê ji vê yekê re bibîne jî, dîsa bi ser ne  
diket. Hewildanên wî mîna vê şevê hemî berteref diçûn. Viya jî ji  
viyalî  
de ew bêtir bêhêvî û qudumşikestî dikir. Hewildanên wî tenê dibûn  
bîrewerî û xewnên naxoş.  
Lê ji ber çi wusa ters diçû? Ev pirsê gelek caran ji xwe dipirsî. Lê tu  
carî  
jî bersiva vê nikanî bû bida. Te digot qey hemû kes û tişt li hemberî  
wî  
ne! Wekî yê îşev ko hati bû li dîskotekê li ser maseya wan rûniştî bû  
û  
keçika ko wî kî dizane bê bi çi hal û keşkûriyê dawetî derve kiri bû,  
jê si-  
tendi bû! »Na!« got. Xwe bi xwe »wî çima ji min sitend, min ew  
dayê.  
Heta min got kerem bike!«  
Lê digel ko Martîn... Belê, yê ko hati bû li ser maseya wan rûniştî bû  
navê wî wusa bû yekî zerik û bêviltûj bû, ew hemberî xwe didît jî  
dîsa  
heyranîyek jê re raber dida.

Ruyê Martînê bêviltûj qet sor ne bû bû û eniya wî jî xwîdan ne dabû, dema ko ji keçika teniştê re goti bû, »em dansê bikin?« Wê demê wî fam

kiri bû ko êdî wenda kir! Û ji ber vê yekê jî tu tişt ne kiri bû û xwe bi xwe

»na! ji xwe ew ê bertelef ba.« got.

Dansa duyemîn li ber muzîkeke sivik bû. Wî dikanî bû hinekî ecele bikira û berî Martîn keçik rakira dansê, lê ne kiri bû. Bi awureke mîna ko

bibê; »te ya pêşîn kir, tu ya duyemîn jî dikanî bikî!« li Martîn nerî bû.

Martîn ji vê awurê razî, berê xwe dabû keçikê û ew cara duyemîn rakiri

bû dansê. Dema keçikê ji Martîn re goti bû; »Erê!« awurek mîna ko bibê;

»bi cihenema te kirî!« di wî de vedabû û paşê bi Martîn re rabû bû dansê.

Trêna dawîna şevê gihîşti bû istigehê. Li vagona kêr mirov, li ser qoltixekî bi tenê ciyê xwe girt û tirên bi rê ket.

Çavên wî li qoltixê dawîya vagonê, aliyê hemberî wî ket. Keç û xortekî

xwe li hevdu rapêça bûn û hevdu maç dikirin. Yê xort her ko keçik ji lêvên wê maç dikir, hejmarek digot, »çil û yek... dudu... sisê«

Viya dîsa hişê wî bir ser Martîn û dansa duyemîn. Di dansa duyemîn de Martîn jî xwe wusa li keçikê pêça bû, hêdî hêdî serê xwe nêzî yê wê kiri

bû û paşê jî ji lêvên wê maçek sitendi bû. Heta ko dans qediya bû, Martîn

hejmara ramîsanana zêde kiri bû. Wexta ko dans qediya bû jî, Martîn de-

vê xwe xisti bû yê keçikê û maçeke nêzî deqeyekê dûdirêj jê sitendi bû.

Xwe bi xwe: »ji bo hinekan jiyan çiqasê hêsan e.« got. Belê, ji xwe ji ber

vê yekê bû ko heyranî raberî Martîn dida. Bi keçikê re axaftin, danskirin

û maçkirin, evan hemî wusa bi hêsanî kiri bûn ko ew li hember van kiri-

nan behitî ma bû. Lewra evana ji bo wî serketinên gelekî zehmet ko in-

38

cex bi xwîn û xwîdanê dikanî bû pêk bihaniya.

Dema ko ji trêne daket û heta ko gêhîşte malê, derî vekir û kete hun-

dur jî her hişê wî bi viya meşgûl bû û bala wî li ser vê pirsê bû ko; »çawa

hinek an gelekî merovan dikanin jiyanê ewçendî hêsan bigirin!« Û paşê

heyfa xwe lê dihanî ko ew ne yekî nola wan merovan e.

Li mala wî ko ji ode û metbexekê pêk dihat her dever rêşkirî û hertişt paqijkirî bû. Dema ko mala xwe wusa dît, beşişî. Êvarê beriya ko biçe

civanê keçikê, bi hêviya ko ew ê wê bîne malê hazirî kiri bû û ne tenê ev

jî: Li odê, li ser masê findeke li bendî vexistinê, şûşekê şeraba Bordeaux li

bendî vekirinê û du piyalên şerabê li bendî tijikirinê amade bûn.  
Qevdek  
gulên sor, zer û pembe jî di vazoyeke titik de li ser masê bûn.  
Cilên xwe ji xwe kirin û hat mase ber bi qaryola xwe ve kişand, finda  
ser  
masê vexist, şûşa şeraba xwe vekir, piyala xwe dagirt û; »merheba  
ji te re  
bêdengî û tenêtî!« got û paşê piyala şerabê bi ser xwe de kir.  
Cara duduyan dema ko piyala xwe tije şerab kir, beriya ko bi ser xwe  
de  
bike, çû seriyê din î odê, ciyê ko teyiba wî lê bû; kaseteke Bethowen  
da ser  
teyibê. Ev konsera Bethowen ya piyanoyê bû. Dûre jî hat, ji şerabê  
dîsa  
hinek vexwar, paşê xwe li ser nivînan ramedand.  
Lê serê wî bi bûyerên şevê ve tijî bû û yek bi yek di hişê wî re derbas  
dibûn.  
Hêj destpêka şevê bû, dema hevaleyê wî jê re telefon kiri bû û ew  
vexwendî bû mala xwe. Lê wî; »na... îşev civanê min bi keçekê re  
heye...  
ez ê şevê ji felekê vedizim!« goti bû.  
Xwe bi xwe; »lê felekê şevê ji min vedizî, weke hercar!« got û di  
dilê  
xwe de hezar nalet û çêr li şans û bextreşîya xwe hanî.  
»Belê,« got. »eger ne ji bêşensî û bextreşîya min bûya, dê çima  
wusa bi-  
ba? Ew Martînê zerik û bêviltûjik ji kuderê derket? Na, ew xisûsî ji  
bo

min ji malê rabû bû û hati bû dîskotekê îşev. Ji bo ko karê min xera bike

û ne ji bo tiştê din!»

Bi rastî jî heta ko Martîn derneketi bû holê hemû tişt baş û li gor dilê wî çû bû. Helbet ev ne dihat wê manê ko di planê wî yê şevê de kêmasî û

qelsî tune bûn. Ya pêşîn di planê xwe de hesabên tiştên ko »ji nişka ve«

biqewumin ne kiri bû. Ji xwe ev Martîna jî ji nişka ve derketi bû holê û

planê wî serûbinî hev kiri bû.

Lê tiştê ko li zora wî diçû ev bû ko tevayiya salekê di gel ko li nexweş-

anekê, li gel keçikê xebitî bû û her roj hevdu didîtin û bi hev re dipeyvîn

jî dîsa cesaret ne kiri bû ko keçikê vexwîne dîskotek an restorantekê. Û wê

39

roja îniyê, piştî nîvro dema li ciyê kar, li oda cixarekêşiyê li gel keçikê tenê

ma bû, dîsa bi nîvhenekî jê re; »ma tu naxwazî bi min re werî ciyekî kêfê?»

goti bû. Dûre jî mîna ko sûcek kiri be sor bû bû, xwîdanê di eniya wî re

dabû der û hindik ma bû ko ji keçikê bexişîna xwe bixwaze û bibê; »bi-

bore, min henekek kir!» Lê keçikê berya wî; »belê, çima na, pir kêfxweş



dibim.« goti bû. Paşê jî li bajêr wext û cî dabûn hevdu.  
Xwe bi xwe; »lê ji bo Martînê bêviltûj nîvsaet ne girti bû ko wê qanî  
bike.« got û rabû piyala şeraba xwe nû kir.  
Lê bi rastî di vir de hinekî neheqî li Martîn fikir, ji ber ko wî ji bo ko  
rê  
li ber Martîn bigire tu tişt ne kiri bû. Heta bi bîr anî ko bi tevgerên  
xwe  
jî alîkariya Martîn kiri bû. Dema Martîn hati bû li ser maseya wan  
rûnişti  
bû, wî dest pê kiri bû û pê re axifî bû û ne dîti bû ko keçik bi madê  
xwe  
naxoşiya xwe li hemberî rewşê nîşan dide. Dema ko muzîka dansê  
dest pê  
kiri bû, diviya bû wî jî weke adetê keçik rakira dansê. Lê ev yeka ha  
qet ne  
li ser bala wî bû û serê wî bi bersiva pirsê ko Martîn jê kiri bû ve  
meşgûl  
bû. Martîn jê pirsî bû; »tu çi karî dikî?« Wî goti bû; »ez li  
nexweşxaneyekê  
dixebitim, li nexweşan dinêrim, xwarina wan didime wan û ciyê wan  
paqij dikim.« Lewra tenê bi vê bersivê ne ma bû û dest pê kiri bû,  
planên  
xwe yên pêşerojê ji Martîn re kat kiri bû.  
Bi katkirina planên xwe yên xwendinê dest pê kiri bû. Îsal ji bo  
xwend-  
inê dereng ma bû, sala bihata wî ê dest bi xwendina lîseyê bikira.  
Piştî ko

salekê wî lîse biqedanda wê çaxê wî ê dest bi xwendina bilind ya asîstaniya

doktoran bikira. Bi dû du salan re dema ko ew jî qedand, wî ê du salan

weke asîstanê doktoran kar bikira û paşê jî dest bi xwendina doktoriyê

bikira.

Martîn ji hêlekê ve guhdariya wî û ji hêlekê ve jî bala wî li ser keçikê bû

û rewşa wê ya naxoş didît. Wî hêj dixwest bibêje ko ew ê çend salan dok-

toriyê bixwîne, lê Martîn ew fersend ne dabûyê û; »Planên te yên xwend-

inê gelekî bi rêkûpêk û xweş in!« goti bû, dûre berê xwe dabû keçikê û ew

vexwendi bû dansê.

Di vir de xeletiya xwe fam kiri bû, lê êdî dereng ma bû. Herweha ji bo

dansa duduyan jî dereng keti bû. Tenê li rêyekê geriya ko qusûrekê bibîne û ji wir bi dûr keve. Di viya de jî wan teksîr ne kiri bûn û alîkariya

wî kiri bûn.

Dema ko ji dansa duyemîn vegeriya bûn ser masê, mîna ko keçik pê henekê xwe bike, berê xwe dabûyê »tu çima dansê nakî?« jê pirsî bû. Wê

gavê devê wî keti bû hev û ne ma dizanî bû ew ê çî bigota; »ez bawer im,

40

min îşev hinekî zêde vexwar!« got.

Wê gavê jî keçikê zûzûka »eger tu xwe nebaş hîs dikî, tu dikanî biçî mal.« jê re goti bû. Bi dû van gotinan re, êdî tenê tiştek dima ko bikira û

wî jî wusa kir.

Dema ko xatir ji keçikê xwesti bû, hîn jî ew tevgera henekpêkirinê li ser

bû. Keçikê bi beşîşîn »gelekî sipas dikim ko te ez îşev vexwendim vê derê.« goti bû. Martîn jî bi tevgereke gelekî ji xwe razî û hinekî jî minetkar; »gelekî memnûn bûm ko min tu nas kirî!« goti bû. Wî tenê

destê wan hejandi bû û ji wir dûrketi bû.

Êdî dawiya şevê bû. Şeraba di şûşê de qediya bû. Bethowen notayên

xwe yên dawîn lêdixistin û finda li ser masê vemirî bû. Her wusa çavên

wî jî hati bûn girtin û êdî xilmaş bû bû.

41

Reşbelek

5 Gulan 1986 / Mêrdîn

Birayê ezîz \*\*\*!

Berî ko dest bi reşbeleka xwe bikim gelek silavên germ ji te re rêdîkim,

ji herdu çavên te ên reş radimîsim...

Lo birawo, ev bûn deh name ko min ji te re şandin, eva jî ya yanzda...

Lê ji te, me hêj tu bersiv ne girt! Qe neba me bizaniya ko tu sax î, rehet î...

Viya wê dilê me têxista cî, kêfa me bihaniya. Diya min bi girî herdu çavên  
xwe kor kirin! Heroj rûdine, saetekê digirî û dibê; »Saloxên \*\* min  
ji min  
re bînin!« Pitepita bavê min bi ser min de, dibê; »Tu ji qezda wilo  
dikî!  
Tu naman jê re naşînî!« Ez fikirîm ko dibe te navnîşana xwe guherti  
be û  
ez çûm min navnîşanek hevalê te ji bavê wî tika kir. Li ser wê  
navnîşanê  
jî min çend name şandin. Lê dîsan jî, digel ko ev serê sê mehan e ko  
em  
bersivekê ji te dipên... bêfêde ye!  
Birayê delal! Em bi hesreta nameyeke te ne. Ez ji te tika dikim... Tu  
ê  
nameyekê ji me re bişînî, vê hesreta me biborî ne. Ma qey tu qet  
nafikire  
ko birayê te, xwengên te, bavê te, diya te, em hemû li hêviya  
nameyeke te  
ne. Ma qey qet em li bîra te nayên!... Tuê me bêderb bikujî lo! Tu  
berê  
ne wilo bûy; nizanim çi bi te hatiye.  
Îro dîsan hingî bavê min kire pitepit, got; »Tu çiman nama jê re  
naşînî!«  
Ez rabûm min rast reya bajêr girt, çûm postexanê da ji te re  
telgirafekê  
rêbikim. Lê karmendekî nas li wir ez bi zor sekinandim û got; »Seyr  
e!

Tuê du rêzikan binivisînê û qiyametek pere bidê! Wisa meke, baştir  
e ko  
tu jê re nameyekê bişînê...« Ez vegeyriyam, li qehwa Omeriya  
rûniştim û  
min dest bi nivisandina vê namê kir. Aha, li ser masa min du  
gundîyên  
me; Cindî û Hamîd jî rûniştine, bi qeremaçan dileyizin. Ew ji silavan  
li  
te dikan.

Wekî din ko tu li me bipirsî; em tev rehet in, bi selamet in. Em tenê  
xweşiya te dixwazin û bi hesret li hêviya reşbeleka te ne.  
Bi silavên germîn...

Birayê te Evdella

42

25 Gulan 1986 / Stockholm

Birayê xoşevîst Evdella!

Reşbeleka we ya bi tarîxa 5.5.1986 kete destê min. Ez pê gelekî  
kêfxweş

bûm, sipas! Her weha namên berî vê jî ko we şandi bûn tev ji mêj  
ve ke-

tine destê min. Lê mixabin ko ji ber hin sedeman min ne dixwest ji  
we re

nama rêbikim. Ango bi şandina nameyeke xwe min ne dixwest we  
têxime talûkê! Bawerim hûn fam dikin bê ez dixwazim çî bibê. ko  
we

ewçend israr nekira min ev name jî ji we re ne dişand.

Birayê hêja! Tu di nameya xwe de dibê; »Ma qey em qet li bîra te

nayên!...« Ma kengî hûn ji bîra min çûne?! Di xewnên min de, di xeyalên

min de her hûn hene; ma li darê dunyayê qet tişteki wisa dibe! Bi rastî jî

bi van gotinên te ez gelekî êşiyam. Û ji îro pêve ez ê bersiva hemû nameyên ko ez ji we bigirim, bidim. Ma qey tu dibê ez naxwazim nameyan ji we re bişînim!...

Wekî din jî qet mereqa min nekin. Ez gelekî baş û rehet im. ko derdekî

min hebe ew jî xweşî û selametiya we ye. Ji dê û bavê min re gelek silavên

min bibêje, ez destê herduwan radimîsim. Gelek silav û giramiyên min ji

xweng û birayên min re pêşkêş bike. Bimînin di xweşiyê de.

Bi silavên biratî

Birayê te

\*\*\*

Tîrmeh 1986 / Izmîr

Reşbeleka te tevî çend polîs û cendirman kete destê me!... Şensê min

hebû ko ez wê rojê ne li mal bûm.

Ro li nîvro cemsak tijî polîs û cendirme, reşbeleka te di dest wan de, di-

girin ser mala me. Hundurê malê qul bi qul saxtî dikin, her weha axur jî...

Helbet tişteki bi dest naxin. Ji xwe ew çend pirtûkên ko te li malê hişti

bûn min ji mêj ve şewutandi bûn. Piştî ko malê saxtî dîkin bavê min  
û  
herdu biran, Kezebo û Fexredîn davêjine cemsê û dibine tabûrê.  
Heftîkê  
ew di bin daran de nehawî kiri bûn. Ji wan re; »Çawa bi vî xayînê  
dewletê  
re têkiliya we hêj heye! Demek hûn jî xayîn in!« dibên û wana didine  
ber  
daran.

43

Ji xwe eynî rojê (bi karekî ez çûbûme gundekî din) gava ko min  
evaya  
bihîst, min go lingo bi qurbano û ez reviyam hatim Izmîrê. Ev serê  
du  
mehan e ko ez li vê derê xwînê me. Li gor saloxên ko min ji mal  
hilanîne:  
Bi dû ko ew berdane, bavê min û herdu bira, heftîkê di nav nivînan  
de  
bêhal raketine. Piştî heftîkê, Kezebo û Fexredîn baş bûne... Lê li gor  
dibêjin, bavê min hêj di nav nivînan de ye û xwîn vedirişe. Gelek  
dibên  
ew ê êdî ji nav nivînan dernekeve.  
Bi kurtî tiştê te û reşbeleka te bi serê me kir, dijmin bi serê dijmin  
nake!  
Ma qey te nizanî bû ko li vir li te digerin! Ma qey te nizanî bû ko tu  
xwîniyê dewletê ye! Ma hewce dikir ko me ji te re bigota... Qaşo tu  
merivekî zana, bîrbir bûy! Kê ji te re got ko tu ê nama ji me re  
bişînî!...

Aha were safî bike vêca! Tu çûy Ewropayê jî, hêj em ji te û bela te  
xelas ne

bûn lo!

Ji bo Xwedê tu careke din xeletiyêke wilo nekî!

Evdella

44

Tabût

Zivistana 1974an bû, gundiyan S. derî Mirad û malbata wî, yê din  
hemû ji mêj ve keti bûn nava nivînan û kî dizane bê ev xewna  
çendan bû

ko didîtin. Ev şeva duduyan bû ko li mala Mirad, lembe wan wisa  
heta

nîvê şevê diçurisî.

Mirad di hundurê oda xwe de li ber soba bê agir paldayî, kaxezek di  
dest de lê dinêrî û diponijî; serî gavê jî serê xwe li ba dikir û dikire  
niçeniç.

Ji nivis û mora li ser dihate famkirin ko kaxezeke fermî ye. Kaxez di  
na-

va tiliyên xwe de bi vir û wir de diqulipand... çep û rast digirt û  
bêwestan

awirên xwe li nivisa ser digirt. Li ser kaxezê tiştê ko pê xerîp ne dihat  
û

dikarî bû bixwenda, bi tenê navê wî bû; »Mirad Çiruk!«

Ji ber ko muxtarê gund kaxez dabûyê her cara ko Mirad li kaxezê  
dinêrî, muxtar dihate bîrê.

Berî du rojan ber bi nîvro du cendirme hati bûn gund, ev kaxeza  
dabûn

muxtêr û bi şûn de vegeyriya bûn. Muxtêr gazî Mirad kiri bû û kaxez



dabûyê. Dema Mirad goti bû; »Ez tiştêkî jê fam nakim!« muxtar berçav-

ka xwe derxisti bû, dabû ber çavên xwe û jê re xwendî bû. Lê wexta ko

Mirad dîsan goti bû; »Min qe tiştêk fam nekir!...« vêca muxtar hinekî bi

hêrs careke din jê re xwendî bû û bêje bi bêje jî wergerandi bû. »»...

Li

dadgeha Komara Turkiyê ya tawangiran, li bajarê M. di tarîxa ... saet...

li... de divê hûn amade bin!«

Mirad ji tirsî ko dîsan muxtar hêrs neke tu pîrsek din jê ne kiri bû, kax-

ez ji dest girti bû û rast rîya mala mamostê gund girti bû.

Lê mamoste jî tiştê ko muxtêr jê re goti bûn ducar kir. Lê dîsan jî

Mirad

têra xwe pîrs ji mamoste kiri bûn.

Tiştê ko lê behîti bû, bê ji bo çî xwestî bûn qet tu sedem di kaxezê de

ne dabûn xuyakirin. Vê yekê jî Mirad gelekî bêhaf dikir û tiştên nebûyî

dihanîne bîrê!

Ev cara pêşîn bû ko kaxezeke wisan fermî ji dadgehê jê re hati bû.

Mirad di jiyana xwe de qet têkilî tu tiştêkî bêqanûnî ne bû bû, ji ber vê jî

dadgeh hêj bi çavên xwe ne dîti bûn. Dema ko ji nişka ve kaxezek wisa ji

45

dadgehê him jî ya tawangiran jê re hat, ew bi carekê qidûmşikestî  
kiri bû.

Nema dizanî bû çî bikira. Ji fikirandina vê bûyerê ne dilê wî diçû  
xwar-

inê û ne jî xewa wî dihat. Ev ji serê du rojan de guhertinek ecêb pê  
re çêbû

bû. Te digot qey ew xwîniyek e û ew ê anuha wî dardekin! Dawiya  
dawîn

jî dest pê kiri bû pir behîtî dipeyvî.

Di ber xwe de; »Ji bo çî? got. Min tu kes ne kuştiye, tu kes ne şeli-  
handîye û dizîya tu kesî jî min ne kiri ye!«

Rabû ser xwe, dîsa rûnişt; fitilî ser pîreka xwe Hezarê ko tevî herdu  
zarokên xwe di quncikekî odê de bêdeng rûniştine. Te digot qey ew  
jî ji

gava ko mêrê wê ev kaxeza girtiye, şînê dikişîne! Mirad mîna ko  
bixwaze,

li ber şewqa lembeya ko bi zor hundurê odê ronî dikir, wan  
bitefsilîne,

serê xwe ber bi wan bir û qêriya; »Min çî kiriye? Sûcê min çî ye?  
Hela

bibêje bê çî sûcê min heye!«

Qidûmê jinikê û herdu zarokan şikest, zarokan hişk bi dawa diya  
xwe

girtin. Hezarê hinekî bi tirs lê vegerand; »Tu sûcê te tune bavo!...  
ma çî

sûcê te ê hebe!«

Mirad serê xwe hejand; »Hii... got. Tu sûcê min tune, nexwe! Ma çî  
sûcê min ê hebe!«

Lê ev gotinên dawîn bi şêleke mîna ko bixwaze bibê; »Ez dizanim bê sûcê min çi ye!« goti bûn.

Bi rastî jî hingî ko fikirî bû êdî serê wî tevlihev bû bû. Wisa bû bû ko êdî wî jî ji xwe şik dikir. Pêre hîsek weke ko li hemberî dewletê hin xerabî

kirine, çêbû bû. Lê bê çi kiri bû qet ne dihate bîrê! Tenê tiştê bi bîr di-

hanî, ew jî ev bû ko carina di derheqê cendirme û tehsîldaran de nebaş

fikirî bû. Wan deman xwestinek mîna ko bi dest biketa û jê bihata, wî ê

kela dilê xwe li van cendirme û tehsîldaran hênik bikira, heta çend kes ji

wan bikuştana jî... Lê ev xwestina xwe ne pêk anî bû û ne jî ji kesekî re

goti bû. Tenê xwestinek jî nikanî bû biba sedemê tu sûcan!

Mirad dîsan çavên xwe li hundurê oda nîvtarî gerand, li pîreka xwe û

herdu zarokan nerî; deng û his ji wan dernediket. Hingî ko xwe bi dîwêr

ve şidandi bûn, te digot qey bûne perçeyekî ji dîwêr. Bi hînetiyeke kevn,

destê xwe xiste bêrîka yelegê xwe da li saetê binêre, lê dema hate bîrê ko

saeta xwe beriya sê mehan winda kiriye, zû paşde kişand.

Di ber xwe de bi dengê nîvxeniqî; »Di kû de zirav be bila di wi de biqete! got. Yekî ko sûcê wî tune be çima ê bitirse! Rabe, nivînan deyne!«

Weke ko tu sîtilek ava sar li dilê jinikê bikî, wisa bîhna wê vebû, ew tirs

ji ser firiya çû û bi lez rabû ser xwe, dest bi raxistina nivînan kir.

46

Bi dû vê navtêdana xwe bi xwe re, te digo qey tirsî li ser Mirad jî kêm

bû bû, hinekî qidûm pê ve hati bû.

Lê sed mixabin ko ev mêrxasiya wî tenê ji bo bêhnekê bû. Dema ko kete nav nivînan, lihêf kişand ser serê xwe, ramanên li dora vê bûyerê fe-

na mêşan ko xwe çawan li şêrînayê bigrin, wisa êrîşî serê wî kirin.

Xwest ko di serê xwe de planekî çêbike, ew ê çawan bersiva pirsên dad-

pirs bide. Lê ji ber ko nizanî bû ew ê çî pirs jê bêne kirin dev jê berda.

Fikir kir ko pêşiyê biçê bi advokatekî bişêwire; lê vê jî mesrefeke zêde

dixwest ko aboriya wî têrê ne dikir...

Hêj wisa difikirî, ji nişka ve germiya laşekî nerm bi laşê xwe ve hîs kir.

Ev germî hin bi hin li laşê wî tevî belav bû, pir jî li xweşa wî diçû. Vê ger-

miyê, rehên laşên wî yên ko ji qehr û tirsê şidiya bûn hemî sist kirin.

Wisa

bi kêr bû ko, serê wî bi carekê re ji ramanan vala kir... xwe bi vê germiyê

ve qenc şidand û di xew re çû.

Heta berbanga sibê, bi xêra germa wî laşê nermik bêxem raket. Lê de-

ma ew germiya ko di laşê xwe de hîs dikir kê m bû, nema lê kê kir;  
ra-

manên bi xof dîsan dest pê kirin di serê wî de veketin.

Di xewnê de:

»Xwe li hundurê odeyeke mezin didît. Li hawîrdora xwe dinerî,  
hertişt

pê eceb dihat. Li hemberî wî, li dora maseyekê du sê kesên bi cube  
rûniştî

bûn. Li her aliyekî wî jî cendirmeyek rawestî bû. Fikirî ko vê derê ê  
dadgeh be û evana jî ê dadpirs bin. Dadpirsekî awireke dijwar tê  
vedida,

dûre jî bi destê xwe tiştê ji ser masê bilind dikir. Mîna ko saeteke  
bêrîkan

bû. Saet nêzî wî dikir, jê dipirsî, »Ev saet ya te ye?« Wî li saetê  
dimeyzand,

fam dikir ko saeta wî ye. Bersiv dida; »Erê ezbenî ya min e!« Bi dû  
de jî

dixwest ko bibê; »Beriya sê mehan min winda kiri bû!« Lê dadpirs  
mefer

ne didayê, gotina wî dibirî û serê xwe dihejand; »Baş e, baş..., digot.

Tu

dizanî bê ev saet li kû hatiye dîtin?« Dadpirs li benda bersiva wî ne  
dima

û axaftina xwe didomand; »Ev saeta li ser cendekê du cendirman  
ko li ser

riya gundê we hati bûn kuştin, hatiye dîtin! Evaya delîlekî gelekî xurt  
e ko

tu berpirsiyarê vê kirinê ye!« Piştî ko gotina xwe diqedand, dadpirs  
destê

xwe ber bi cendirman dikir û digot; »Wî bibin!«

Gava ko cendirman dikirin wî bibin, Mirad li ber xwe dida. Lê herdu  
cendirman hişk bi çeplên wî digirtin û ew bi dû xwe de dikişkişandin.  
Bi dû xwe de, di derîyekê re ew dixistin hundurê hewşeke fereh.

Dema

Mirad didît ko di hewşê de kindirekê dohnkirî bi dara sêpîyê ve li ba  
dibe,

heta ko jê dihat diqêriya, xwe davêt erdê... Lê cendirman ew ji erdê  
bilind

47

dikir, li ser destên xwe ew dibirin binê dara sêpîyê. Destên wî li paş  
girê-

didan, ew derdixistin ser sandaliyekê; yekê ew digirt û yê din jî kindir  
dikire situwê wî. Bi dû de jî sandalî ji bin lingan dikişandin. Pê bi pê  
bîh-

na wî diçikiya, wexta dikir ko bifetise, ji nişka ve ji xew vediciniqî!«

Dema ko ji xew çemd bû, dît ko pîreka wî ya di xew de, çeplê xwe li  
situwê wî gerandiye. Wisa şidandi bû ko Mirad bi zor bîhna xwe  
digirt û

dida. Bi lez situwê xwe ji çeplê wê xelas kir, rabû ser xwe. Ji tirs  
laşê wî

tev dilerizî. Lê dema bi ser hişê xwe ve hat û fam kir ko eva tenê  
kabûsek

bû gelekê kêfa wî hat!

\*\*\*

Sibê:

Mirad ji bo ko ê biçuwa dadgehê gelekî bi heyecan bû. Nema dizanî  
bû  
ê ji kuderê dest pê bike! Geh diçû axur li heywanan dinêrî, geh dihat  
hun-  
durê odê li zarokan dinêrî û hinekî jî bi sobê ve dilebikî. Di dawiya  
dawîn  
fam kir ko divê haziriya xwe bike. Ewê hêj du saetan bi rê va biçuwa  
heta  
ko bigihiştta ser asphaltê û ji wir jî ê bi tirumpêlekê riya xwe  
bidomanda.  
Mirad çavê xwe li pîreka xwe gerand, dema ew di hundur de ne dît,  
bi  
dû de qêriya; »Hezarê! Hezarê!...« Hinekî şûnde deriyê odê vebû,  
pîreka  
wî derbas bû hundur. Ji nanên di dest de xuya dikir ko çûye ji  
cîranan  
nan deyn kiriye.  
Rebenê ji pêr de, ji xema ne nan û ne jî xwarin çêkiri bû. Lê vê sibê  
ji  
bo ko mêrê xwe birçî bi rê neke; şorbeyeke nîskan dabû ser êgir.  
Dema  
dîti bû nan qedîyaye, ji neçarî çû ji cîranan deyn kir.  
Ji aliyekî him berfa li ser xwe dadiweşand û him jî ji Mirêd re; »Li  
der  
berf û bahoz e! Çûk bi çûkaniya xwe, gur bi gurîniya xwe, ji sermayê  
li der  
nikane bisekine. Tu ê çawa biçî?«  
Mirad serê xwe rakir, awirek tê veda û tenê got; »Kincên min hazir

bike!«

Hezarê awirê mêrê xwe ya cidî fam kir ko minaqeşe bêfêde ye. Paşê rast

çû sindoqa xwe ya bûkaniyê vekir, kincên Mirêd yên herî paqij jê derx-

istin û anîn li ber danîn.

Bi dû ko Mirad taştîya xwe xwar, bi lez rabû ruwê xwe kur kir û paşê jî

dest pê kir kincên xwe li xwe kirin.

Wexta ko Mirad îşlegê xwe yê sipî î ji hîzar, ko pîreka wî jê re dirûti bû,

li xwe kir fena kefenekî li ser qama wî ya kin rûnişt. Derpiyê wî yê sipî ko

heta bi ser kabokên wî dadiket, te digo qey alîkariya îşleg dikir û kefen

48

timam dikir. Lê gava ko panteron bi ser de li xwe kir têmtilê wî hinekî

edilî. Ji xwe kincên wî jî her evan bûn. Eger xwest ko kevnexaxê xwe ko

te tayek jê bikişanda ê tev verşîya li xwe ke jî, dît ko têmtilê wî ê bi carekê

xera bibe, dev jê berda. Bi dû ko qapûtê xwe li xwe kir, şewqa xwe di serê

xwe de ediland, destmalek jî di ser şewqê re li binguhê xwe pêça. Paşê

qewlikê xwe yê peran kontrol kir û xiste bêrîka xwe.



Di wê navbênê de çavên wî li herdu zarokên wî ket, pêre pêre dilê wî  
şewutî, hezkekê pê girt, kelogirî bû û çû herdu zarokên xwe hemêz kirin.  
Dema keça xwe ya biçûk, Zerî hemêz kir, bêhemd gilorîkên wî hatin xwarê. Bi lez pêlava xwe kire lingên xwe û di derî re derket.  
Riya esfaltê ji gund teqnekî dûr bû. Li gund tu tirumpêl tune bûn; ji bo  
ko meriv biçuwa bajêr diva bû ko meriv ji gund derketa ser riya esfaltê û  
ji wir tirumpêlek bigirta. Wexta ko dunya xweş bû ev riya bi peyatî saetek  
dajot lê dema ko zivistan bû ev riya nêzî du saetan dikişand.  
Digel berf û bahoza ko dihat dîsan jî Mirad xwe zû gihandi bû ser riya  
esfaltê. Lê şensê wî! Tirumpêlê ko dihatin lê ne disekinîn.  
Li ser esfaltê nêzî saetekê li hêviya tirumpêlan ma. Destê xwe ji hemî  
tirumpêlên ko derbas dibûn re bi mana ko rawestin bilind dikir... digel bi  
tilîya xwe nîşan dida ko rêwiyekî bi tenê ye jî dîsan tu tirumpêl ne disek-  
inîn. Ji xwe li ser rê ji wî pê ve tu kes tune bû.  
Dûre hêviya xwe qut kir, ji nuha ve dest pê kiri bû ji sermayê di cihê xwe de dicirifî. Li şûna xwe li qeremîska rûnişt, serê xwe xiste nava qapûtê  
xwe û xwest bi hilma xwe destên xwe yên nivqefilî bigermîne.

Xwe bi xwe fikirî ko paş de vegere malê, lê vê saetê ev fikir ji serê  
xwe  
avêt. Xwe bi xwe; »î!« got. »Na!... evaya ne karê min e. Mala  
min, zarokên min... na li darê dunyayê tişteki wisa nabe. Ez ê herim  
ji  
hakim efendî re bibêm: Ezbenî va ye ez hatim! Çi gunehê min hebe  
ez jê  
re amade me; eva serê min û ewa şûrê we! Hûn çi ferman bikin!...  
ma wê  
çi ferman bike, ew ê ji min re bibê; “Rabe lawê min yê şîrhelal, min  
tu efû  
kir” û ez ê bi şûn de vegerim malê!«  
Hêj wisa di van ramanan de bû, dît ko yek lê diqîre. Bêyî ko haya wî  
jê  
çêbûbe otobozek ji evên piçûk hati bû li ber sekinî bû.  
Mirad rabû ser xwe, ber bi otopoza piçûk çû. Şofêr; »Tu ê bi kû de  
biçî?« Mirad; »Ez ê biçim bajêr« got. Şofêr; »Siwar be!« got. Mirad  
di  
pacan re çavek li hundur gerandi bû, dît ko rê û rêwanî di hundur  
de tun-  
eye. Dema ko dîsa li şofêr meyizand, şofêr serê xwe bi jor de kir; »Li  
jorê  
siwar be« got. Miradê ko ji serma dicirifî qet tişteki wisa ne dipa. Lê  
şofêr  
49  
ew xiste ber fedîyan, li rêwiyên din nerî bû û berê xwe pê ve kiri bû;  
»Tu

mîna nehîtekî ye, ma wê çî bi te bê! Aha saeteke, em ê vega bigihêjin ba-  
jêr... pênc lîra bide bes e!» got. Êdî ji fedîyan ba jî Mirad ê siwar biba,  
qewlikê xwe derxist pênc lîre hejmartin dane şofêr û çû paşîya otopozê bi  
derencekên wê ve hilkişîya.  
Wexta ko hilkişîya jor û çavên wî li tabûta ser ket, xwest paş de vegere.  
Lê şofêr gaz dabûyê û Mirad ji bo ko nekeve xwe hişk bi hesinên kêlekê  
ve girt.  
Mirad di rewşeke xirab de bû, ji sermayê êdî hertişt ji bîr kiri bû.  
Tenê  
hêvî dikir ko nuha li ber sobeyeke germ paldayî ba. Ji bo ko nekeve diva  
bû xwe bigirta û viya jî rê ne didayê ko bi hindikayî jî ba, xwe ji sermayê  
biparazta.  
Hinekî wisa di vê rewşê de, ji nişka ve tabûta li teniştê ko lê dimeyizand,  
fikrek şeytanî di serê wî de pêxist! Xwest ko vê fikrê zû ji serê xwe bavêje,  
lê sermayê rê ne da... Xwe hinekî nêzî tabûtê kir. Bi destekî xwe girt û bi  
destê din jî li werîsê ko pê tabût şidandi bûn, xebitî. Werîs di ser tabûtê

re avêti bûn û bi hesinên kêlekê ve girêda bûn. Mirad dît ko werîs sist e,

bi dû ko ew jî hinekî pê lebikî, ew baş sist kir û bi aliyê lingan ve dehfand.

Êdî dikarî bû qepaxa tabûtê vekira, ji ber ko qepax jî li çepê bayî bû, viya

jî karê wî hêsantir dikir.

Lê ka ew dilê ko biwêre qepaxê vebike! Eger ko yekî mirî tê de ba! Vê

wextî Mirad ji fikra wî vegeranda. Lê bi qasî serma ko dixwar ewçendî jî meraq li ba wî çêbû ko binêre bê çi di hundurê tabûtê de heye.

Bi dû ko hinekî wisa dudilî ma, di dawiya dawîn de biryar da ko qepaxê

hilde.

Dest pê kir qepaxa tabûtê hêdî hêdî rakir, lê ji bo ko zû jî bigire xwe hazir kiri bû. Eger ko çavên wî li paçekî sipî, li destekî an li tiştêkî din biketa, wî ê qepax di dest de bigirta.

Lê wexta ko qepax baş bilind kir û çavê wî li tiştêkî ne ket, bêhna wî ve-

bû, kêfa wî hat. Serê xwe xiste hundurê tabûtê û li aliyê lingan jî baş nerî,

gava qenc fam kir ko vala ye hêdîka çîpeke xwe tê de dirêj kir û wisa yê

din jî...

Tabût mezin bû, bi rehetî xwe tê de dirêj kir û fikirî ko ew ê yekî din jî bi rehetî xwe bikari be li teniştê dirêj bike! Dema ko qepaxa wê girt

hundurê tabûtê bi carekê tarî bû, lê, xem ne dikir, ji wê zemherîra der

xweştir bû!

Bi dû ko teqnekî bi rê ve çû bûn, rastî gundekî, otoboz li ber du rêwiyên

50

din jî sekinî bû. Yê şofêr ew herdu jî li jor siwar kiri bûn û ji wan re goti

bû; »Li jor yekî din jî heye!«

Dema herdu rêwî li jor bi cî bûn û li wir ji tabûtê pê ve tiştêkî din ne dîti bûn, gotina yê şofêr bi mana; »Yekî mirî li jor e!« bi mane kirin û di

ruwên wan de xuya dikir ko kêfa wan ji vê heneka şofêr re ne hati bûn.

Miradê ko di taya sermayê de bû, deng ji xwe dernexisti bû û tiştêk li xwe

çênekiri bû. Lê dema ko wisa jî mane kiri bûn, gotinên ko di camiyê de

ji melê, di derheqê dunya din de bihîsti bûn, hemû bi bîr anîn! Hemû çîrok û meselên di derheqê miriyan de di hişê wan re wê gavê derbas

dibûn. Hemû milayîketên ko navê wan dizanîbûn bi bîr anîn! Viya jî tirs

û xofa mirinê xisti bû dilê wan!

Di wê navbêne de jî rewşa Mirad pir xerab bû bû. Sermayê ew di hun-

durê tabûtê de jî rehet ne hişti bû. Bayê ko di qulikên tabûtê re dikete

hundur li kezeba wî kêr dikir. Dûre biryar da ko ji tabûtê derkeve.  
Difikirî ko otobozê rawestîne û biçe ji wan tike bike bê çihekî jê re  
di  
hundur de çênakin.  
Dema ko ji nişka ve qepaxa tabûtê lebitî, gwîn li herdu rêwiyên  
vemirî!  
Ziq li hev nerîn û li tabûtê nerîn! Şik jê re tune bû, mirî bi ruh dibû!  
Qapûtê Mirêd jî di kelemekî de awiqî bû û nikanî bû jê xelas bike.  
Heta  
ko di hundurê tabûtê de milên xwe ji qapût kiri bû, şewqe û  
destmala wî  
jî ji serî keti bûn. Dema ko heta newqê xwe ji tabûtê derxist, destên  
xwe  
dirêjî herdu rêwiyên kir da alîkariya wî bikin...  
Miradê bi ruwê xwe yê ko ji sermayê reşûşîn bû bû û bi îşlegê xwe  
yê  
mîna kefenekî, ji saxan zêdetir mirîyek dihanî bîra meriv! Dema  
destê  
xwe jî ber bi wan kir, rêwiyekî xwe ne girt û xwe ji otobozê werkiri  
bû!  
Ew ê rêwiyên di hundur de diti bin loma jî li şofêr qêriyabûn û  
otoboz  
zû rawestandi bûn.  
Hemî rêwî ji otobozê peya bû bûn ko binêrin bê çi qewumîye!  
Dîmena  
li ber çavên wan hemû di cî de matmayî hişti bûn!  
Mirad bi zor xwe ji tabûtê xelas kiri bû, lê lingên wî hêj di tabûtê de  
bûn

û şipya bû. Wexta dît ko rêwî tev lê ecêbmayî dinerin û rêwiyên pîrek;

»Pepûk! Pepûk!« dibên, destê xwe bilind kir û got; »Ez!...« Xwesti bû ko

bibê;»Ez ji saxa me, ne mirî me!« Lê zimanê wî negeriya û ji ser otobozê

kete xwarê.

Ji sermayê qefilî bû.

51

Terorîst

Sal, hezar û nehsed û heftê û yek e; bûyerek ko li gundekî Mêrdînê diqewume rojeva Turkîyê dagir dike û ji hêla raya giştî ve bi baldarî tê

taqîpkirin.

Li gor agahdariyên rojnameyan li vî navçeyî terorîstek peyda bû bû.

Lê,

dîsan li gor şiroveyên wan ev terorîstekî gelkî xweser bû û bi tu diruvê

terorîstekî din ve ne diçû: di dîroka Turkîyê de ko ji vê hêlê de zengîn bû,

heta nuha mînakên wusan ne hati bûn dîtin. Rojname zêdetir li ser metodên wî disekinîn û digotin; »Ew metodên ko terorîst bikar tîne tay-

betî ne! Ew êrîşên xwe bi şevê, dema hîvtarî ye dike. Ê heta nuha jî ew

êrîşên xwe li ser leşkerên ko harisê tixûbê Sûrîyê ne dike. Gelekî balkêş e

ko heta nuha vî terorîstî hêj fîşek ne teqandiye. Tenê di tarîtiya şevê de ew digire ser kozikên leşkeran û ji nişka ve wan diqutifîne. Bi vî babeti heta nuha sê leşker şehît xistine!«

Lewra rojnamevanê ko ev nivis nivîsî bû, hezar caran poşman bû ko çavên xwe li vê dunyaya fanî vekirîye û şîrê diya xwe mêtiye! Ji ber ko or-diya tirk eva li xwe weke heqareteke mezin qebûl kir û bi çeplê rojnamevan girtin, ew avêtin zindanê û ji wê rojê û vir de ji vî rojnamevanî kesekî tu salox nema hilanî!

Paşê jî serokgeneralê ordiyê xwe mecbûr dît û di radyo û televizyonê de gotarek da; di gotara xwe de got ko: »Mehmetçîk ji tu tiştî û tu kesî natirse! Yê ko terzî vê dibên xayînên millet û dewleta me ne!« Bi dû de jî ferman da ordiyê ko çi pêwist be bikin, ji bo ko vî terorîstî sax an mirî bi dest bixin. Ji bo vê vatiniyê jî tabûrek qumando rêkirin navçe. Tabûra qumando di navçeyê de dest bi operasyonan kir û piştî çend rojan jî netîce girt: sitatîstîka operasyonan, çar gundên şewutî, panzdeh zil-amên ko bi îşkencê seqet ma bûn û sê sed gundiyên girtî bûn. Gundiyên hewar û gaziya xwe gihandin nûnerên xwe ko di parlamen-toyê de bûn. Nûneran ji gundiyan re gotin ko ew ê nikari bin tu sozê



bidine wan, ji ber ko eva meseleke leşkerî bû. Lê dîsan jî tiştê ko ji destê

wan bihata ê bikirana, diva bû şika gundiyan ji vê yekê tune ba, ji ber ko

52

aha dîsan wexta hilbijartinê bû û pêwistiya wan gelekî ji dengên gundiyan hebû.

Rîsîpiyên gundiyan hêj li Ankarê, li hêviya bersiva parlamenterên xwe

bûn, dema ko ji navçe saloxên xêrê bihîstin. Parlamenterên ko ne dixwestin xwe bi carî gundiyan bixin, bi dû van saloxên xêrê re, hatin xwe

zûzûka gihandin gundiyan û gotin ko hukûmetê bi ya wan kiriye û loma

ev operasyonana hatine rawestandin. Lê heqîqet helbet bi babetekî din

bû, ji ber ko hemû gundên navçe para xwe ji van operasyonên tabûra

qumando girti bûn.

Di wê navbênê de êrîşên “terrorist” jî rawestiya bûn. Lê herkesî eva bi

hilatina hîvê ve girê dida û digotin: »Dema ko dîsan hîvtarî bibe ewê terorîst dest bi êrîşên xwe bike!«

Bi rastî jî ew her her panzdeh şevên ko tava hîvê bû, tu deng û salox ji

terorîst derneketin. Ê heta bi dû hersê şevên ko hîvtarî bû jî tiştê ne

qewumî. Lê şeva çaran terorîst dîsan êrîşek biri bû ser wan û di vê  
êrîşê de  
leşkerekî din kuştî bû. Sibehî dema ko kontrol çûbû ser kozikan, ji  
bo ko  
harisan biguhere, leşkerek di kozika wî de mirî dîti bûn. Karbidestên  
leşkerî zû dest danîn ser vê meselê û ne hiştin ko di vê derbarê de  
tu în-  
formasyon belav bibe.  
Lê eger ne bi tevayî bûya jî dîsan di rojnameyan de hin salox belav  
bû  
bûn. Li gor van saloxan MÎT'ê di derheqê vî terorîstî de hin agahdarî  
bi  
dest xisti bûn û hevî dikirin ko di wexteke kin de ew ê wî bigirin.  
Piştî çend rojan di hemû rojnameyên Turkîyê, di bergê pêşin de, xe-  
berek hebû; »Terorîst girtin!« Ê li bin vê xeberê jî wêneyek hebû.  
Di  
wêne de, zilamekî navsere bi rî û şaşik li ber kerekî rawestiya bû. Li  
gor sa-  
loxên rojnameyan, terorîst heta nuha êrîşên xwe li ser vî kerî dikirin.  
Di  
êrîşa dawîn de, şopa ker hati bû derxistin û çend şopgerên jêhatî  
şop  
gerandi bûn û terorîst li mal, li gel kerê wî zeft kiri bûn. Heta digotin  
ko  
ew di amadekirina êrîşin nû jî de bû...  
Wê rojê li Turkîyê, êdî li sûka reş jî rojname peyda ne dibûn. Ew  
kesên

ko di jiyana xwe de qet rojname ne kirî bûn û nexwendî bûn jî çû  
bûn ro-

jnameyek sitandî bûn. Rojtira din gelek rojnameyan çapa xwe ducar  
kiri  
bûn.

Bi dû çend rojan de hate famkirin ko yê wekî terorîst hatiye girtin  
melayê gundê P'yê ye. Mela herçendî goti bû ko bêguneh e, dîsan  
jî ke-

sekî jê bawer ne kiri bû. Dadistên di derheqê mela û kirinên wî de  
dosyek ji du sed rûpelî amade kiri bû û ji bo mela tawanê herî giran,  
53

dardekirin xwesti bû.

Rojnamekê jî di derheqê mele û jiyana wî ya terorîstî de lêkolînek  
çêkiri

bû û eva perçe bi perçe heroj çap dikir. Li gor saloxên rojnamê  
têkiliyên

mela bi Ermenîstan û Yewnan re jî çêbû bûn û ji van dewleta pere  
dis-

tandin, ji bo ko li Kurdistanê serhildanekê li darxe û Turkîyê perçe  
bike.

Rojekê jî rojnamê secereya bav û ejdadên melê weşand û bi vê riyê  
mele

hate agahdarkirin ko di eslê xwe de ew ne ji Neqşebendîyan, lê ji  
Bedirxaniyan e; bavê wî û Emîn Bedirxanê ko mîrê kurd yê dawîn  
bû pis-

mamên hev bûn. Wekî din jî xezûrê bavê melê di serhildana Şêx  
Saîd de

beşdar bû bû. Rojnamê lê zêde dikir û digot ko; »Mele li pey heyfa  
bav û  
kalê xwe ye!«  
Mele di rewşeke xirab de bû û dizanî bû ko şensê wî tune, ji bo  
ko  
bikari be bêgunehiya xwe îspat bike. Hemû kesî û hemû tiştî li dij wî  
dig-  
ot! Di rewşeke wusan neçar de, mîna hemû mirovên dîndar melê jî  
li  
ocaxên xwe, yên mîna Şêx Evdilqadirê Geylanî, kire hewar û gazî û  
li  
hêviya deriyekî xêrê ma.  
Piştî demekê, di wexteke ko mehkemeya melê nêzîk dibû û hêviya  
wî  
kêm bû bû, te digo qey ocaxên melê dengê wî bihîsti bûn û di  
hewara wî  
de hati bûn. Ji ber ko dîsan leşkerek li ber tixûb di kozika xwe de  
mirî hati  
bû dîtin. Ew jî mîna yên din navqetî bû bû, lê bi şewê fermî digotin  
ko  
“hatiye fetisandin”. Lê ya baş ji bo melê ew bû ko, li ser kozika yê  
leşker  
şopa pîkola kerekî hati bû dîtin. Eva delîleke xurt bû ko terorîst hêj  
ne  
hatiye girtin. Ji ber ko kerê melê weke unsûrekî tawanê melê li  
hêviya  
mehkemeyê, li axurê belediyê girêdayî bû.

Piştî vê bûyerê karbidestên leşkerî yê heremê biryar dan ko wan kesên

xwedî ker in teva bigrin bin çavan. Bi dû vê fermanê de li heremê bi hezaran kerên bêxwedî û beradayî bi çolê de terqiya bûn! Lê di vê navbêne de tabûra qumando jî dest bi operasyonên xwe kiri bû. Di op-

erasyonan de kerek li kuderê didîtin ew gulebaran dikirin û dikuştin.

Bi

vî babetî wan dixwest rê li “terorîst” teng bikin.

Wusan hêj qumandoyan kuştina keran didomand û ji nişka ve vê bûy-

erê regekî navnetewî girt. Ji ber ko çend wêneyên kerên gulebarankirî di

rojnameyên Ewropî de jî çap bû bûn. Van wêneyan tesîra xwe li hîsên

Awropîyan yê ji vî alî de nazik, kiri bûn û dilê teva şewutandi bû.

Loma

jî hemû komikên heywanparêz seferber bû bûn û bi riya Konseya Awropî

dewleta Turkîyê protesto kiri bûn. Di protestoyê de xwestinek jî hebû ko

Turkîyê divê problemên xwe yê etnîk bi riyên demokrasiyê hal bike.

54

Serokwezîrê Turkîyê, Cengîzhan Selçûkê ko heta nuha xwe di qultixê xwe de giran kiri bû û ne xwesti bû van bûyeran şirove bike, rabû di tele-

vizyonê de axaftinek kir. Di axaftina xwe de, serokwezîr, weke welat

serxwebûna Turkîyê parazti bû û goti bû ko; »Mafê welatên din  
tuneye  
ko têkilî karên Turkîyê yên hundurîn bibin. Dewlet him li mirovê  
xwe  
dixe û him jî ji wan hez dike, eva kesekî din eleqedar nake! Ya din jî  
li  
Turkîyê tu meseleke etnîkî tuneye. Ew tirkên ko weke kurd tên  
nasîn li  
Turkîyê hemwelatîyên di dereca yekemîn de ne! Lê li welatê me li  
vê  
herema paşmayî, meseleke terorê heye. Di eslê xwe de evana  
Ermenî ne  
û ji Yewnan jî alîkariyê werdigrin ji bo ko welatê me perçe bikin. Lê  
dewleta me bi hêz e û ew ê vê meselê çareser bike. Ê di vê  
çareserkirinê de  
jî dewlet û qewetên leşkerî tu carî jî ji prensîbên demokrasîyê dûr  
nekevin, bila şika tukesî ji vê çênebe! Awropî dibên hêzên leşkerî  
ker gule-  
baran kirine, eva jî ne rast e û propaganda terorîstan e; tenê li cihekî  
ere-  
beyek leşkerî li binguhê kerekê ketiye û ev kera mirîye, lê eva tenê  
qezeyek  
e û qezên wusan li Ewropa jî çêdibin!« Bi dû axaftina serokwezîr re,  
li  
Turkîyê minaqeşa li ser terorê û talûka perçekirina welêt gur bû bû.  
Rojnameyan heroj li ser têkiliyên terorîstan ko bi Ermenî û Yewnan  
re

hebûn, dinivisîn. Li gor saloxên rojnameyan; heremên rojhilat tijî  
çek û  
cepxane bû bûn, bi gotineke din digotin; »Bûye kodika barûdê! ha  
dite-  
qiya, ha diteqiya!...« Heta rojnameyekê nivisî bû ko »Dehlîzek  
binerdê di  
navbêna Agirî û Êrîvanê de hatiye tespîtkirin û çekên ko hatine  
welêt  
hemû di vê dehlîzê re derbas bûne.« Lê çend roj şûnde hate  
famkirin ko  
eva ne tu dehlîz, tenê şikeftek bû!  
Di hengameyeke wusan de rojekê serokgeneral derket di radyo û  
tele-  
vizyonê de gotarek da. Got ko: »Terorist ê pêşin di ser cenazê min  
re der-  
bas bin û paşê vî welatî ê perçe bikin!« Bi dû vê gotarê re hêj çend  
roj ne  
buhurî bûn û generalan hemû hikum kirin destê xwe.  
Rojekê di televizyonê de xeyala zatê serokgeneral û çend  
qumandanên  
wî xuya bûn. Bi dû bêhniikeke bêdeng re serokgeneral şekirek  
şikenand û  
dest bi axaftinê kir: Di axaftina xwe de da famkirin ko parlamento  
fesex  
kiriye û serokwezîr jî avêtiye zindanê. Paşê jî da famkirin ko ew ê ji  
bo de-  
mekê him serokwezîr û him jî serokkomar be. Lê dîsan jî ji bo ko şaş  
neyê

famkirin ê kincên leşkerî ji xwe nekirana!  
Eva dihate wê manê ko hemû tiştên çapemenî û weşanî dikete bin  
kon-  
trola hêzên leşkerî. Ji ber vê yekê jî tu salox û agahdarî di derheqê  
bûyerên  
ko li vî navçeyê Mêrdînê dibûn, nema gihişt raya giştî û heqîqeta vê  
55  
meselê ji xelkê veşartî ma. Hêzên leşkerî bi carekê perdeyek  
kişandin ser  
vê meselê û bi vî babetê mesele tefandin.  
Lê dibên, zeman hakimê adil e û eva gelekî jî rast e. Ji ber ko beriya  
de-  
mekê pirtûkek lêkolîner û kurdnasê Rûsî Îskenderovê Baba çap bû  
bû.  
Di vê pirtûkê de Î. Baba, çend nivîskar û şairên kurd yên vê demê jî,  
li gel  
berhemên wan dide nasîn. Ji herema Mêrdînê jî behsa nivîskarekî  
bi navê  
“Xwînherê Kurdî” dike. Î. Baba heyfa xwe lê tîne ko di derheqê jiyan  
û  
navê vî nivîskarî yê rastîn de, tu agahdarî bi dest ne xistiye. Tenê  
çend  
nivîs û şîirên vî nivîskarî ko bi dest xistiye, di pirtûka xwe de  
weşandiye.  
Xwînherê Kurdî, di bin sernivîseke; »Ji nifşê ko bê re!« bûyerên wê  
demê  
jî kat dike û rastiya li paş van bûyeran bi vî babetê jêrîn şirove dike:



»Eva serê demekê ye ko zilm û zordariya dewleta tirk û hêzên wê yên  
leşkerî, li vê navçeya me bêhawe zêde bûye. Heta nuha pênc gundên nêzî  
xeta tixûbê Sûrîyê bi carekê ve şewutandine; bi sedan gundî bê sedem ha-  
tine girtin û işkencekirin. Dewlet ji gundiyan re dibê “hûn terorîstan vedişêrin û ev terorîst bi şevê digrin ser kozikên leşkeran û wan difetisînin!” lê heqîqeta meselê ne wusa ye.  
Li gundekî navçe kerekî bêxwedî hebû û eva hertim nêzî xeta tixûb ji  
xwe re diçêriya. Ez nizanim bê ji ber çi sedemê bû, lê vî kerî qet ji leşkerên  
tirk hez ne dikir û li kû didîtin êrîş dibire ser wan. Eva carekê min bi çavên xwe ditin. Rojekê leşkeran bi tirumpêlekê girtin ser gund ko saxtî  
bikin. Dema ko leşker li nav gund belav bûn, min dît ko ev ker nêzî tirumpêla wan bû û bi zîtirkan herdu lempeyên wê yên pêşin şikenandin.  
Bêşik yê ko bi şevê jî êrîş dibire ser wan ev kera bû û di êrîşa dawîn de jî  
şehît ket!  
Di wexteke ko mêrê kurd bi xwe li doza xwe xwedî dervediket, kirinên  
vî kerî ji bo min serefrazîyek bûn û ez bi kirinên wî dilşa dibûm û bi mi-  
rina wî jî gelek êşiyam. Ez ji nifşê ko bê, hêvî dikim ko kirinên vî kerî ji

bîr nekin.«

Eger ne ji Xwînherê Kurdî ba, ê rastiya vê bûyerê jî mîna gelek bûyerên

din, di taritiya dîroka me de winda bibaya. Herweha ji xeyn vê nivisê Xwînherê Kurdî bîrewerîya vî kerî bi şîireke xwe jî aniye zimên, berî ko

ez li vir niqteyekê deynim ez ew şîira Xwînherê Kurdî jî pêşkêşî we dikim:

### KERÊ BI NAMÛS

Bi tarîxa heftê û yekê hîva dehan bîst û yekê

Li serxetê li ber qelêç leşker girt dora gundekî

56

Wisa neyar wisa dijmin tifing dagirt ji fîşekê

Şevê reş î pir tarî bû saet li duwnzdeh û yekê

Kerek hebû qut î kem bû him jî kor bû bi çavekî

Rengê wî reş qama wî kin umrê wî li dor çar û yekê

Beradayî bêxwedî bû kesî ne dihewand malekê

Bi namûs û pir zana bû û zû neyaran nas dikî

Him fêris û qehreman bû çêtir ji şêr û filekî

Wî leşker dît li ber benê hema bi lez hicûm dikî

Bi zirzirê û qorqorê leşker li erdê dirêj dikî

Paşê li ser pîkolê dikî

Qudûm şikest nav qetiha bi ser de mîza zer dikî

Navê wîya Dûrmîş bû û navê bajarê wî Hendekê

Qumandan hat ser lê nerî dît ew çawan sikratê dikî

“Eywah oglum şehit duştun” ker jî zir zira xwe dikî

Gundî civand zirta dikî wana davêje feleqê

Temo weke mêran qîrek dayê tu çi dawê li me dikî

Qutifîye leşkerê te ji kerê qut î kem bi çavekî  
Rabûn bi lez leşker civand wîna davêjin cemsekê  
Berî bighin nexweşxanê can da nema çav bel dikî!

57

Teyrekî zêrîn

Rojeke havînê î germ bû. Wê rojê O. piştî nîvro hinekî zû karê xwe  
qedandi bû û rast riya malê girti bû.

Roya ko ezmanê bê ewr î hêşîn ronahî dikir, bi tîrêjên xwe yên germ  
ve

pîr û kal, keç û law ji hunduran dikişand derve û berên wan dida nav  
park, bexçe û peravan. Li vî welatê wisa sar, rojên wisa germ bi rastî  
jî ne

erzan bûn. Dema ko bi dest jî diketin, xelkê welêt dizanî bûn ê  
çawan bi

kar bînin. Hemû derdiketin seyrangehan, şahî dikirin û li peravan  
laşên

xwe yên sipî li ber tîrêjên royê diqemirandin.

Lê O. yê ko bi eslê xwe ne rûniştevanê vî welatî bû, xwe biyanî hîs  
dikir

û zêde beşdarî seyran û şahiyên xelkê welêt ne dibû. Digel ko çend  
caran

hevalên wî yên kar, ew wexwandibûn hin şahiyên jî, O. fam kiri bû  
ko ne

li gor wî ne. Ji ber ko musulmaniya wî destûr ne dida ko ji goştê berêz  
bita-

mîne û tîna xwe jî bi şeraba sor bişkîne! Ger ko xwesti bû di van  
şahiyên

de hinekî bireqise jî lê, li ber musîqa ko guhên wî cara pêşin dibihîst,

lingên wî bi ya wî ne kiri bûn! Loma jî beşdarbûyîna şahiyên betal  
kiri bû.

Carekê jî dema ko çû bû peravê, kincên xwe ji xwe kiri bûn, xwe li  
ser

destmala xwe dirêj kiri bû û xwesti bû mîna hemû kesan ew jî laşê  
xwe di

bin tîrêjên royê de biqemirîne. Lê piştî demekê, komek zarokên  
meraq-

dar hati bûn li dorê kom bû bûn û xwesti bûn vî mehlûqatê bi laşê  
reş û

pirça gelek, analîz bikin. Wê gavê wî, xwe mîna meymûnekê ko ji  
bexçeyekê heywanan reviyaye hîs kiri bû û loma jî kincên xwe li xwe  
kiri

bûn û ji wir bi dûr keti bû. Ji wê rojê û vir de jî nema diçû ber  
peravan!

Îro jî mîna hercar rîya malê girti bû. Lê dîsa wî dil hebû ko laşê xwe  
li

ber rojê bigermîne. Ji ber ko balkona wî li alîyê roya piştîvroyê  
diket û

li wir bi rehetî dikanî bû evaya bikira.

Dema ko gihişti bû malê jî, wê gavê kincên xwe danî bûn; tenê der-  
pîyekê sporê li xwe kiri bû, rahişti bû pirtûkekê û hewl dabû ko  
derbasî

balkonê bibe. Lê wexta ko dikir deriyê balkonê veke, ji nişka ve  
rawestiya

bû; tişteki ko li ser maseya balkonê dibiriqî, bala wî kişandi bû.

Pêşiyê got

qey xwelîdanka tîtikî ye, lê gava ew tiştê tîtikî xwe livandi bû, ew di cihê

58

xwe de behît ma bû û bawerî bi çavên xwe ne anî bûn. Dev ji vekirina derî

berda bû û dest pê kiri bû li vî tiştî temaşe dikir.

Teyrek bû, mîna kevokekê mezin bû. Lê tenê ji hêla mezinahiya xwe de

li diruvê kevokê diçû...

O. tu carî teyrek wisa xweşik ne dîti bû. Na! Ne di ansîklopediyan de û

ne jî di muzeyên çivîk û teyrikan de rastî teyrek wisa xweşik hati bû... tenê

di çîrokên perîyan de saloxên teyrikên wisa bihisti bûn. Teyrek wisa xweşik û çeleng tenê hunermendekî dikanî bû biafiranda û ew jî ne hemû

hunermend, tenê yekî nola Hefaîstosê Yewnanî ko Xudayê hunermendiyê bû, dikanî bû heq ji tiştê wisa derketa!

Perîyên teyr mîna ko di ava zêr de bûbin dibiriqîn û li dorê şewqa taceke zêrîn çêdikirin. Nikilê teyr mîna yên kewan sor bû, lê sorekî tarîtir

bû û lingên teyr jî mîna ko zivîn bûn diçirûsîn. Lê ji hemû tiştî zêdetir çavên teyr yên ko weke du stêrkan di ezmanekî tarî de diçurisîn bala wî

kişandi bû û meraqa wî zêde kiri bû. Bêdeng û his, bi heyranî li sipehitiya

teyr temaşe dikir û jê têr ne dibû. Çendî ko lê dinerî, teyr li ber çavên wî

sipehîtir û heyraniya wî ya jê re jî zêdetir dibû. Awirên wî li ser teyr  
asê bû

bûn.

Hinekî şûnde jî xebxeba teyr mîna dilekî piçûk lêdixist, teyr dest pê  
kiri

bû dixwend. Lerzekê bi laşê O. girti bû, di cihê xwe de dicirifî. O. bi  
heyranî û evînî li vî dengê hindik ko ji paş deriyê girtî dibihîst,  
guhdarî

dikir. Ev denga pê xerîb ne hati bû, mîna ko di dilê xwe de gelek  
caran bi-

hîsti bû hîs dikir. Weke dengê sitraneke bêrîkirin û evînê dilşewat  
bû.

Dengê zirav, te digot qey ji viyolîneke perçeyekî musîqa Mozart  
der tê.

Paşê teyr dev ji xwendinê berda bû û li ser maseya balkonê doş  
dibû.

Di wê nawbênê de jî O. difikirî, xwe bi xwe; »Nebe ko ev teyra birçî  
be

û hinek zad dixwaze? got. An, dibe ko sitiriyek keti be lingan û  
dixwaze

ko ez wî sitiriyê derînim! An jî dibe ko teyrek kedî be û dixwaze  
bikeve

paşila mirovekî!»

Wexta ko wisa fikirî, biryar da ko derî veke. Lê gava dikir ko derî  
veke

pirsên din di serê wî de vêketin.

Xwe bi xwe; »Dibe ko qet jî ne birçî be û tu sitirî jî di lingan de tune

bin« got. »Herweha dibe ko qet jî ne teyrek kedî ye û naxwaze bikeve

paşila tu mirovan! Tenê, dibe ko refê xwe winda kiri be, westiyaye û

dixwaze hinekî bîhna xwe berde, ji bo ko paşê bifire û dîsa bigihêje refê

xwe«.

O. ji xofa ko ew ê teyr bitirsîne û eva ê wê gavê bifire, here bi riya xwe

59

de, derî venekiri bû. Bi hindikayî ba jî dixwest ji xwe re kêliyekê lê temaşe

bikira.

Hinekî şûnde teyr dest pê kiri bû, xwe ji ser maseyê çeng fikir, mîna ko

dixwest derbasî hundur bibe xwe li pacê dida. Wê gavê jî O. ji bo ko keşif

nebe û teyr netirsîne, daketi bû ser çogan, xwe li paş dîwêr veşarti bû. Lê

piştî ko teyr xwe çend caran li pacê dabû, westiya bû û dûre rawestiya bû.

Wê gavê O. dîsa rabû bû ser xwe û temaşekirina xwe ya teyr domandi bû.

Piştî ko teyr hinekî din jî li ser maseyê doş bû bû, ji nişka ve baskên xwe

vekiri bû û firiya bû. O. derî vekiri bû, baz dabû balkonê. Di wê bêhnkê

de dixwest biba teyrek û li dû bifiriya; lê nikanî bû! Ji dêla vê ve bi  
dû de  
qêriya; »Neçe bi paş de were! Min têra xwe li te ne nerî!...« got. Lê  
teyr dût  
keti bû, dengê wî ne dibihîst. Tenê çend ciranên wî ko li balkonên  
xwe  
rûnişti bûn qêrîna wî bihîsti bûn, ji hev re gotin; »Çi bi viya hatiye?  
Ev  
dîn bûye ko destên xwe ber bi ezmên vedike û diqîre!«  
Belê O. dîn bû, sermest bû, ne li ser hişê xwe bû! Teyr firiya bû lê  
mî-  
na ko tiştêk ji canê wî girti be û bi xwe re biri be, wisa êşek dijwar û  
şînek  
hîs dikir.  
Dema ko behîtmayî li dû teyr dinerî, çavên wî ji hêsiran tijî bû bû.  
Teyr  
ber bi royê firiya bû û di çend saniyan de ji ber çavên wî wînda bû  
bû. Lê  
ji hiş û fikra wî ne firiya bû! Bi şev û roj li bala wî bû. Dema ko radiket  
li  
xewna wî, dema ko hişyar bû jî li fikra wî bû. Hezkirin û bêrîkirina wî  
ya  
ji teyr her ko roj derbas dibûn, xurtir dibû.  
Bi çend rojan şûnde jî, çû bû qefesek kirî bû, anî bû li balkona xwe  
dardekiri bû. Tasek av û tebsikek zad li balkonê danî û heroj nû  
dikirin.  
Ji wê rojê û şûnde jî deriyê balkonê vekirî hişti bû. Gelek çivîk û teyr  
hati



bûn hêlînên xwe di qefesê de çêkiri bûn, ji zad û avê xwari bûn,  
vexwari

bûn û paşê jî bi riya xwe de firiya bûn û çû bûn. Lê teyrê zêrin ji wê  
rojê

û şûnde qet xuyanî ne kiri bû û bi paş de ne hati bû.

60

Tirşikçî

Ber bi êvarekê li bajarê N'ê li quncikekê kêmmirov ya kaféyekê, du  
camêrên ji hazira ne zêde rûnişti bûn. Him çaya li ber xwe  
vedixwarin û

him jî daxêvîn. Ji xwe di vê wextê de, li kaféyên bajêr zêde mirov  
peyda

ne dibûn. Eger karekê girîng î van camêran tune ba, ewan jî mîna  
hemû

camêrên din yê xwedî famîlye ê serê vê êvarê li nav zarokên xwe  
bûna û

ji şîva ko xatûnên wan çêkiriye ê tam bikirana.

Ji herdu camêran, yê kin î dagirtî, rûçikqelew û çavbeloq, germa  
germa

daxêvî. Wexta ko deng jî fikir mîna siyasetgeran hemû laşê xwe  
dilivand.

Ji vê livandina laşê wî meriv têderdixist ko dixwaze yê hemberî xwe  
qanih

bike.

Jê re digot:

Lawo Mehmûdo, min bavê te baş nas fikir, rehma Xwedê lê be;  
mirovekî baqil bû. Lê tu qet li diruvê wî ne çûye! Nizam tu çima  
wisan

bêaqil î? Ma malê dewletê bi serê te ketiye! Her û wer tu harisek î!  
Mehmûd bi temênê xwe hinekî ji yê hemberî xwe ciwantir, zilamekî  
porsor, dirêj û bejinzirav bû. Lê bi awirekê meriv têderdixist ko ev  
be-  
jinziraviya wî ne xwezayî ye, herweha çavên wî yên ko di kortên xwe  
de  
dikirin winda bibin, şahidiya bêvîtamîniya di laşê wî de dikirin.  
Serê xwe rakir, bêyî ko tiştêkî bibêje li yê hemberî xwe nerî. Lê bi  
tewra  
xwe da xuyakirin ko ev gotinana di wext û cihekî cuda de dikanî bû  
bibana sedemê şerekî mezin di nawbêna herduwan de. Lê nuha  
xem ne  
dikir; ev gotinana ji heqaretekê zêdetir, wekû şîretekê qebûl kirin û  
paşê  
jî gulpek ji çaya ber xwe vexwar. Mada wî ya vala, bergirtiya vê çayê  
kir,  
lê bi qurequr mîna ko bibê; »Ez ne çayê, xwarinê dixwazim!«  
nedilxweşiya xwe raber da.  
Yê din li cihê ko gotina xwe birî bû, dîsan dest bi axaftinê kir:  
Ca bibê! Ma ez ne rast dibê? got.  
Mehmûd:  
Belê, lê...  
Yê din gotina wî birî û:  
61  
Lê çi? got. Dewlet çi mehanyê dide te, ez dizanim; sê hezar lîre! Lê,  
ma  
ev perena debara te dikin? Helbet na, wê têrî çi bikin û çi nekin?!  
Eva

kirya xênî, mesrefa malê, ya zarokan û ya te!...

Yê ko nizanî ba ew ê bigota qey bi rastî jî evî çavbeloq gelekî li ber zehmetiyên Mehmûd yê aborî dikeve û dixwaze alîkariya wî bike.

Lê ne zû de bû, dema ko du sed lîre ji Mehmûd re pêwist bû bûn û çû bû cem ko jê deyn bike. Lewra wî bersiv dabû, goti bû ko nizam nuha çend hezar lîre deyn lê ne û heroj deyndaran dihatin deynê xwe dixwestin, lê çerxiyekî wî jî tune bû ko bida wan. Ji bo viya jî hemû milayîket û ewliya şahidê wî bûn ko wisa ye!

Rastiya li paş vê germî û nêzîkiya ko Girzo belê, navê yê çavbeloq wisan bû ji Mehmûd re raber dida, helbet bi babetekî din bû, sedemên wê hebûn.

Girzo li bajarê N. yê mitahidî dikir û di avakirina xaniyan de şîşên hesinî jê re gelekî pêwist bûn. Ne ji ber ko li bazarê şîşên hesin tune bûn û wî nikanî bû bikirîna! Lewra mîna her mitahidî kêfa wî ji mesrefên zêde re ne dihat. Ji ber vê jî di avakirina xaniyan de, ji vê hêlê de gelekî xesîsî dikir. Ewqas ko çend xaniyên paş de dabûn xwediyên bi dû demekê de tebiqî bûn û xwediyên wan li dadgehê giliyê wî kiri bûn. Vê yekê jî destûra mitahidiya wî xisti bû talûkê. Wekî din jî perên ko ji vê xesîsiya

xwe fêde kiri bûn, wekû bertîl dabûn dadistên.  
Lê nuha Mehmûd jê re dermaleyek bi dohn bû û qet ne difikirî ko  
vê  
fersendê ji dest xwe birevîne. Eva jî ji ber wê yekê bû ko Mehmûd  
notir-  
vaniya fabrîqeyekê dikir. Li vî quncikê welêt, her ko hîlbijartina ji bo  
par-  
lamentoyê nêzîk dibû, karbidestên dewletê dihatin bîngêhê  
fabrîqeyekê  
datanîn û soz didan xelkê ko ew ê mecalên kar û xebatê ji bo wan  
zêde  
bikin. Lê dema ko hîlbijartin diqediya, kesekî nema tu salox ji wan  
digirt,  
ta hîlbijartineke nû. Bi vî babetê jî bîngêhên fabrîqeyên ko datanîn,  
gelek  
caran tenê ji koncalek 23 (Kvadratmeter) pêk dihatin.  
Lê qirdê Mehmûd hebû, ji bo bîngêhê vê fabrîqeyê, bi qasî 40 ton  
şîşên  
hesinî jî anî bûn li wê derê danî bûn û Mehmûd jî notirvaniya vî  
hesinî  
dikir. Girzo ko çavên xwe berda bû van şîşên hesin, dixwest bi perekî  
hindik Mehmûd qanîh bike û biçe wan bar bike... Helbet ev perên  
hindik jî ji bo Mehmûd zêde bûn û gelek ji wan xewn û xeyalên wî  
yên ji  
bo dewlemendiyê pêk dihanîn.  
Girzo di axaftina xwe de bi Mehmûd da famkirin ko Mehmûd çendî  
feqîr, perîşan û pêwistiya wî ji peran heye. Wekîdin jî li ser fêda  
peran ko

62

li şexsê mirov dibe û çawan qîmet û giramiya şexs bilind dike, rawestiya.

Girzo:

Li min binêre, ma ez kî me? got. Ez jî yekî nola te lawê gundîyekî xizan

bûm. Berê kesekî qîmeta min ne digirt û gotina min li nav xelkê pênc pere ne dikir. Lê nuha ji ber ko çend qirûş perên min hene, dema ko ez

diçim cihekî xelk bi giramî ji ber min radibin û cihê baştirîn di civatê de

didine min û dema ko ez deng jî dikim civat bêdeng dibe û li gotinên min

guhdarî dikin. Eva ji bo te fersendek e!

Mehmûdê ko li ber destê dê û bavekî dîndar mezin bû bû notirvanekî

sondxwarî bû û ne dixwest têkilî malê heram bibe. Girzo ji vî xuyê Mehmûd jî haydar bû; ji ber vê jî rengê axaftina xwe guhert, anî ser mesela dîn û dewletê. Ji Mehmûd re şirove kir ko eva dewletek kafir e û

tu têkilîya wê bi dînê îslamê ve tune. Ji ber ko nûnerên parlamentoyê

teva ne nimêj û ne jî rojî digirtin. Wekîdin jî;

Girzo:

Ev ne dewleta me ye, digot. Ma tu nabînî ko xortên me li hemberî wan

dest bi şer kirine; heroj polîs û ajanên wan dikujin. Heqê wan jî heye.

Beriya demekê çend xort hatin cem min, yekî ji wan digot; »Apo,  
hayê  
we ji dîroka me tune. Vê dewletê bi sedhezaran mirovên me  
kuştine û  
ew bê cî û bê war kirine! Lawên kurd yê qehreman mîna Şêx Seîd,  
Seyîd  
Riza bi dardekirine. Malê xelkê me, petrol û komira me heroj talan  
dikin!« Ma tu dibê qey gotinên vî xortî ne rast in? Belê ser dînê min  
be ev  
hemû rast in!  
Mehmûd tenê guhdarî dikir; ji xwe wexta ko dixwest deng jî bike,  
Girzo rê ne didayê û gotina wî nîvçe dibirî.  
Êdî derengî êvarê bû, nava Mehmûd î vala jî qurequra xwe zêde kiri  
bû;  
êdî dengên mîna hewaran derdixist. Herdu camêran fam kirin ko  
wexta  
çûyîna malê ye. Lê beriya ko ji hevdu biqetin, Girzo ji Mehmûd soz  
girt  
ko ew li ser vî tiştî baş bifikire, xew bike û di wexteke nêzîk de  
bersivekê  
helbet yeke erênî bidiyê.  
Dema Mehmûd ghişt malê, pîreka wî, şîva wî ko ji girara rij û  
pîvazekê  
pêk dihat, danî ber. Mehmûd li girarê nerî û li pîreka xwe nerî, xwest  
ko  
tişteki bibê lê pîreka wî rê ne dabûyê û;  
Ez çûm ba Salihê qesab! got. Lê ji min re got ko heta mêrê te deynê  
xwe

nede ez giramek goşt jî, bi deyn, nema didime we!  
Mehmûd dengê xwe ne kir û dest bi xwarina xwe kir. Lê gotinên  
pîre-  
ka wî ne qediya bûn.

63

Pîreka wî:

Îro xwediyê xênî jî hat, deynê xwe xwest, got. Heta mehekê mihlet  
da

me, an ew ê me ji xênî derbike. Ji bo van zarokan jî divê ez cawekî  
bikir-

im û berdilkan ji wan re bidrûm. Îro ji bo ko bê berdilk çû bûn  
dibistanê,

mamostê wan ew paş de şandin malê!

Mehmûd dev ji xwarina xwe berda û li bêrîka xwe xebitî. Qewlikê  
xwe

derxist, perê tê de tevî yên hesinî, hemû li ber pîreka xwe vala kirin.

Aha, ji te re! Perên min ev in! got. Tu pê çî dikirî, bikere...

Pîreka wî pere ji erdê berhev kirin û hejmartin. Hemû 142, lîre û 50  
qirûş bûn; fikirî ko ew ê têrî cawekî erzan bikin.

Bi dû van xeberên naxoş re, bija Mehmûd reviya bû, dilê wî nema  
diçû

xwarinê, loma jî dev jê berda bû.

Gotinên Girzo careke din di serê wî re derbas bû bûn. Heqîqeta li  
paş

van gotinan beyan bû, tu delîl ji feqîrî û perîşaniya Mehmûd re ne  
diva

bû. Digel ko pêşniyara Girzo gelekî cazib bû jî, dîsan ne dixwest têkilî  
malê heram bibe.

Lê, mîna ko dibên çavê timayê kor e, gelek lawên bavan yên şîrhelal  
bi  
vî babetî ji rê derketine û Mehmûd ne awarte bû. Di çend rojan de  
baw-  
eriyê wî ya li ser helal û heramiyê sist bû bû. Êdî ji sedî sed baweriyê  
xwe  
pê tanî ko eva dewletek kafir e! Dema rojekê jî înkognîto ji melakî  
pirsî  
bû, wê gavê melê jî fitwe dabûyê û goti bû:  
Xwarina malê kafiran helal e! Heta xêr e jî...  
Wê çaxê Mehmûd biryara xwe dabû.  
Dema şevêkê bi derengî hati bû malê, êdî ji feqîriyê xatir xwesti bû!  
Pîreka wî heta derengî şevê bi dilekî taswas li hêviya mêrê xwe ma  
bû.  
Mehmûd derengî şevê dema di derî re derbasî hundur bû bû,  
çenteyek di  
bin çengan de bû û devliken bû. Çente li ber pîreka xwe danî bû û  
jê re:  
Bi xatirê te, feqîrî, goti bû.  
Pîreka wî pêşiyê tiştêk fam ne kiri bû, gava Mehmûd jê re goti bû;  
Çente veke!  
Wê jî vekir û matmayî jê pirsî;  
Te benqeyen şelihandine?  
Mehmûd:  
Lê nepirse, got. Dema Xwedê dide meriv napirse, tenê dixwe!...  
Paşê jî dema pîreka wî xwesti bû peran bijmêre, Mehmûd;  
Na! got. Min hejmartine, 300 hezar lîre ne!  
Di vî karî de helbet yê ko fêda mezin kiri bû Girzo bû, lê evan ji bo



64

Mehmûd jî ne perekî hindik bûn. Di jiyana xwe de, Mehmûd tu carî ne

bû bû xwediye xwe û ewqas pere û eger ne bi riyeke wisan ba jî ê nebû

ba... Xwediye ewqas pere, li vî bajarî eger ne mirovekî zengîn ba, feqîr jî

ne dihat hesibandin. Lê Mehmûd ji wê şevê û vir de xwe nola zengînekî

bajêr dihesiband. Zengînekî bajêr jî diva bû mîna zengînekî bijiya û wisan jî kir.

Xaniye xwe ne guhert lê ji nû ve raxist. Digel ko ne pêwist bûn jî gelek

tişt kirî bûn, evana zêdetir ji bo xemilandina malê bûn. Li gel van tele-

vizyoneke rengîn tişteki ko li malên zengînan jî kê m peyda dibû kirî bû.

Ji xwe famîlye, kevnîkên kincê xwe bi carekê avêti bû û teva kincên nû ji

xwe re kirî bûn.

Êdî ji wê rojê û vir de Mehmûd zilamekî meşgûl bû û di bazarên mezin

de bû. Di demeke kurt de jî navê tucarekî mezin bi dû xwe xisti bû! Êdî

li bajarê N. yê ko dixwestin xaniyên xwe, otomobîlên xwe, an jî dikanên

xwe bifroşin, berê li Mehmûdê tucar digeriyan!

Mehmûdê ko pirî caran nizanî bû ê wexta xwe çawan biborîne,  
nuha  
mecbûr dibû ko ji zemanê xwe yê kin re programekê çê bike! Wextê  
wî  
ewçend kin bû bû ko êdî hergav pê re ne digiha ko ji bajêr vegere  
malê,  
firavîn an şîva xwe li gel zarokên xwe bixwe û dîsan paş de vegere  
ser karê  
ticarîyê û bazarên xwe! Lê xem ne fikir, perên Mehmûd hebûn û  
dikarî  
bû li bajêr, li aşxaneyekê jî xwarin bixwara. Merivekî nola wî, êdî ji  
vê  
saetê şûnde ê neçuwa aşxaneyeke ji berê de, helbet! Çend roj  
şûnde  
Mehmûd li aşxaneya »Palaza Zêrîn« mêvanekî herwext bû. Ji  
xwarina wir  
zêdetir kêfa Mehmûd jê re dihat ko, dema şagirtan ew wekû;  
»Mehmûd  
Beg!« bi nav dikirin û xizmeta wî dikirin.  
Di wexteke kin de, tucarî û ziyaretkirina cihên mîna »Palaza Zêrîn«  
gelek dostên nû jî ji Mehmûd re çê kiri bûn. Gelek ji karmend û kar-  
bidestên bajêr nasîna xwe dabûn Mehmûd. Di nav van dostên nû  
de, yên  
berbiçav, dadistên û komserê polîsan bû! Di vir de divê were gotin  
ko  
evana ji wî zêdetir, dostên perên wî bûn! Mehmûd jî qet xesîsî ne  
dikir,

hergav ko li cihekî rûdiniştin ê wî beriya teva qewlikê xwe derxista  
û  
hesab bida. Lê dostaniyên wisa, li gel îmkanên nû, problemên nû jî  
bi  
xwe re dihanîn. Dîwar bi guh bûn û gotin digeriya!  
Demeke tevlihev bû; guherînên sîyasî û civakî heroj li binguhê  
hevedin  
diketin û di van qezeyan de hercar bi dehan mirov dimirin, bi  
gotineke  
din dihatin kuştin! Partîya Gel dest bi şerê çekdarî kiri bû û hercar  
di  
belavokên xwe de li dijminê xelkê, xayînên welêt gefit dikirin. Lê  
hayê  
65  
Mehmûd ji van guherînan tune bû û zêde bala wî jî ne dikişand. Ta  
ko  
rojê dema herdu zarokên wan, serşikestî, bi girîn ji dibistanê  
vegeriya  
bûn malê! Bi rê de çend zarokên din keti bûn pêşiya wan, li wan xisti  
bûn  
û gotibûn ko; »Bavê we Tirşikçî ye!« Wê çaxê Mehmûd fam kir ko  
ev  
dostaniyên nû ê belena bînin serê wî!  
Mehmûd biryar girt ko ji van têkilîyên nû xwe hinekî dûr bixe. Ji ber  
ko êdî perên wî jî kêmbûn. Lê çendî xwe li malê giran kir, rîya  
xwe bi  
tu aşxaneyên mîna »Palaza Zêrîn« nema xist jî, dîsan gotinên li ser  
têk-

ilîyên wî yên bi komsêr û dadistên re zêde dibûn û kê m ne dibûn!  
Heta

carnan dema ko di kolanê re derbas dibû gotinên naxoş mîna;  
»Tirşikçî!«

û »Caş!« dibihîstin. Ger ko li çend cihan Mehmûd xwesti bû xwe bi-  
parêze û ji xelkê re şirove bike ko şaş têgihiştine, rewşa wî ne wisa  
ye, lê

kesekî baweriya xwe pê ne anîbû. Ji ber ko maldariya xwe ya ji nişka  
ve

nikanî bû ji xelkê re eşkere bikira. Lê paşê Mehmûd fikirî ko divê  
çareyekê bibîne da navê xwe paqij bike. Ger ko ji xelkê re rewşa xwe  
nikanî ba şirove bikira, bi kêmanî dikanî bû eva ji Partiya Gel re  
eşkere

bikira. Bi baweriya ko ê ewana wiya fam bikin xwest ko li gel Partiyê  
têk-

ilî deyne.

Di vê nawbêne de Partiya Gel jî ranewesti bû; Mehmûd jî kiri bûn  
lîsteya xayînan û di derheqê wî de lêkolînên xwe kwîr kiri bûn! Ji  
xwe ev

hewldanên wî yên dawîn ko dixwest li gel Partiyê têkilî deyne, weke  
xetereke mezin didîtin!

Şeveke xortekî nenas li derîyê malê xisti bû û xwesti bû ko Mehmûd  
li

gel wî were. Digel ko Mehmûd ew wexwandi bû hundur jî yê xort li  
ber

derîyê hewşê, li reşayê li hêviya wî mabû. Mehmûd zûzûka kincên  
xwe li

xwe kiri bûn û dabû pey yê xort, ji malê derketi bû.

Sê roj şûnde, li bajarê N'ê li bin pirekê, laşê zilamekî hati bû dîtin; bi derbekê, ji paş serê xwe hati bû kuştin. Li ser jî belavokek hebû:

»Xayinê

xelkê ji alî dadgeha xelkê ve hatiye cezakirin, bila eva ji bo xayînan mî-

nakek be!« nivisî bû.

66

Dilop

Dipa! Tarîtî, şev dipa! Li benda avaçûna royê û tarîtiya şevê bû. Ji bo ko

bikari be derkeve der doş bibe, hinek hewa paqij bikişîne cîgerê xwe ev

pêwist bû, ango avaçûna royê û tarîtiya şevê...

Tenê tarîtiyê dikarî bû ew veşarta, ew ji ber çavan winda bikira da tu

kesî ew nedîta...

Gelek caran li reşikê şevê fikir hawar da hinekî din şevê dirêj bike, ji bo

ko bikanî ba xwe bigihanda şikefta xwe. Te digot qey carina reşikê şevê

dengê wî dibihîst û teşiya xwe hêdî hêdî dirist û giloka şevê dom fikir, şev

dirêj dibû; wê çaxê ew jî berî rojhilat digihişt cihê xwe...

Di şikefta xwe de, li ser cihê xwe dirêjkirî diramiya: Di tarîtiya şikeftê de ronahî difikirî û di tenêtiya xwe de jî mirov... Li ser cihê xwe ramidandî dengê dilopên şikeftê dihatinê; şikeftê dilop fikir... li dilopan fikirî. Hinekî wisa domand fikirandina dilopan. Li xweşa wî diçû dengê

wan. Dilopan ew ji heqîqetê bi dûr dixist, ew paşde vedigerandin  
rojên

buhurî, zarotiya wî dihanîne bîrê...

Xilmaş bû, serê wî tewiya ser balgiha ko ji pûş çêkiri bû. Ev balgiha  
ji

pûş nuha bû bû balgihek ji hirîyê û ruwek hîzar li ser bû, dora wê jî  
neqîşandî bû. Doşeka wî bostekê ji erdê bilind bû, ew jî ji hirîyê bû;  
li-

hêfek ji hirîyê jî bi ser de kirî bû...

Nuha, li ser nivînên xwe ramedandî dengê dilopan dihatê. Dilopan  
digot: »Niqq... niq, niq...« Zivistan bû, belê zivistan bû wexta ko di  
nava

nivînên xwe de ramedandî dengê dilopan dibihîst.

Wê şevê ji erd û ezman baran dibariya, ji ber vê jî xaniyê wan dilop  
dikir. Diya wî, firaxên ko di malê de hebûn tev danî bûn bin cihê ko  
dilop dikirin, tepsik, legan, tepsîn û teşt... Yek ji leganan jî danî bû  
ber

serê wî, ji ber ko wê derê jî dilop dikir...

Li ser piştê vezilandî, li siryaqa xênî dinerî. Li beştên teloşmelo û  
mirdyaqên riziyayî, li pûşê ser mirdyaqan meyze dikir. Ji dixana  
agirê ko

di hundurê malê de dibe tev reş bû bûn. Hinekî wisa li siryaqa xênî  
temaşê dikir. Bihar hate bîrê, zarokên hevalên xwe bi bîr dihanîn;  
dema

67

ko tev de diçûne çolê, kereng diçînîn difikirî... Xweşiya biharê xeyal  
kir,

wexta ko ji çîçekan tacek dirist û dida serê xwe... Pîvok dihatine  
bîrê: »Ew  
serikê wa yê sipî bê çiqas xweş bû!« Ji nişka va berxikê xwe Kudik bi  
bîr  
dihanî. Bi lez dixwest ko vê fikrê ji serê xwe bavêje, lê xilmaş dibû,  
êdî di  
xew re diçû...  
Çaxê biharê bû, genim seridî bûn. Wê rojê dîsa bi çend hevalên xwe  
re  
li ber berxikan bûn. Berxik li nava zeviyên nêzî xetê diçêrandin. Hayê  
wan ji bayê felekê tune bû. Berxik xwe serî xwe berda bûn û ji xwe  
re di-  
leyistin, bi botika şivanan dilîstin. Botik ya wî bû, paçek li ser çavên  
wî  
girêdayî, bi vir û wir de dibeziya ko hevalekî xwe bigire. Dûre  
hevalekî  
xwe digirt. Destekî wî hêj bi kincê hevalê wî ve û bi destê din dikir  
ko  
paçê ser çavên xwe hilîne, ji nişkê ve qupîna tifingekê ew di cî de  
mat di-  
hişt. Bi lez paç ji ser çavên xwe hiltanî û tevda li alîyê ko dengê  
tifingê jê  
hati bû dinêrîn! Leşkerê ko notirvanê xetê bû, berxikek wan î ko  
nêzîkî  
têlên xeta sînor bû bû, kuşti bû. Bi lez berxikên xwe yên din  
dicivandin û  
ji wê derê bi dûr diketin. Wî di tunebûna Kudikê xwe de zû derdixist.

Kudikê wî li ser xetê hati bû kuştin, laşê wî li wir bû. Bi kelogirî riya malê

digirt, baz dida...

Ji nişkê ve ji xew vediciniqî! Hinekan li deriyê mala wan dida. Ji dengên

wan fam dikir ko romî ne. Ji nava nivînên xwe derdiket û diçû hişk bi

dawa diya xwe digirt. Bavê wî radibû, diçû derî vedikir. Bi vekirina derî

re, sê çar romî pevra diketin hundurê malê. Sisiyan ji wan mal saxtî dikirin û yek jî dihat ji bavê wî pirsra wî dikir, digot: »Ka! Lawê te li kû

ye?...« Ew hîn bêtir ditirsiya û xwe di nava kirasê diya xwe de vedişart.

Romiyên hundurê malê qul bi qul saxtî dikirin, dûre yekî ji wan ew di

nava kirasê diya wî de keşif dikir û li romiyên din diqêriya, digot: »Werin!

Va ye, min zeft kir!...« Çawa ko teyrên mirara ji hewa xwe dadidin ser laşê heywanekî mirî, romiyên li hundur jî hemûyan bi hev re

wisa xwe dadidan ser wî! Yekî ji wan bi çepelê wî digirt, ew dikişand û yekî

din jî destê xwe bilind dikir sîleyek li binguhê wî dixist...

Gava ko ji xew çemd bû, dît ko dilopek ji bin zikê şikeftê bi ser eniya wî

de ketiye... Hinek ji ava dilopê herikî çavê wî, fena ko barût têkeve çavê



wî, ji ava dilopê jenî...

68

\*\*

## MEMEDÊ ZIRAV

ince Memed

(Kurd Memed)

Nivîskar Yasar Kemal

Wergêr Perwîz Cîhanî

\* Ev wergera hê li çî cîhên dî nehatîye  
wesandinê

Berekên çîyayên Toros heylo ji lêvarên  
Derîyaya Sipî ra dest pê dibin. Ev lêvarana  
ku herdem bi pêlên sipî û kefgirtî têne  
kutanê, bere bere ta qûçên bilindên çîyan  
pêş da diçin.

Li raserî Derîyaya Sipî hemêse gultên  
ewrên 'kever berrîdene. Lêvara Derîyaya  
Sipî best û vekirîye. Axa wê ku xwalîya  
sore, wusan hulûye; tu dibêjî qey hatîye  
sûtin û simsad kirinê. Xwalîya sor bînanî  
goste. Ev 'erdana bi rêya demjimêran dûrî  
derîyayê jî bêhna tunde xoyê û bêhna  
derîyayê didin. Bêhna xoyê tund û tîje.

Pistî zeviyên sovkirî yên besta xwalîya sor  
bisiyên Çukurovayê dest pê dibin.

Çukurova bestek bê ser û bine, ku li bêhna  
tunde hisinatîya xizike kolên tûverreskên  
rixtim, cegen, qamûs, dirrîresk û

3

lawlawkên beyanî da, ku tu dibêjî qey bi  
hev va hatine hûnandinê, winda bûye.  
Besteke ku ji cengelên nenas jî nenastir û  
tarîtire.

Hindekî wêdatir hezekên berfire dest pê  
dibin. Hezekên ku li dirêjatîya rêya ku  
alîyekî da ber bi Anavarzayê û li layê dî da  
jî eger kesek tê ra derbas bibe, ber bi  
Osmanîyê berve diçin û digîjin Islahîyê.  
Ev hezekana li danê havînê da bilqe bilqa  
wane hildikelin. Vêca wusan pîs û genî  
dibin, ku mirov nesê nêzîkî wan bikeve.  
Bêhna genîye cegen, pûs û pelas, saz û  
qamûs , çiq û sax û xwalîya rizî lê quloz  
dibe. Lê zivistanan aveka fûrrvedayîye zip  
û zelal û herrike. Havînan rûyê avê li ber  
kewz û qamûsan nayê xûyanê. Lê

zivistanan av wekî çarseveka armûsîn  
vedibe.

Pistî van hezekana dîsan zevîyên sovkirî  
dest pê dibin. Xwalî çivir û birqonek û  
zeliqoke. Û ji bo destvehatek libê çil lib,

4

libê pêncî lib ra hatîye amade kirinê.

Xwaliyeka germ û nerme. Mirov ku li  
topkên vergirtî li darên mêrsînê û bêhna  
wane giran derbas dibe, ne ji gav da zang û  
zinar dest pê dibin. Wusan ne ji gav da  
dest pê dibin, ku mirov vediciniqe. Di gel  
zangan darên çamê dest pê dibin. Sîreya  
darên çamê wekî libên sûseyan dilopî ser  
axê dikin. Mirov ku ji yekimîn çamistanê  
derbas dibe, dîsan digîje bestên rast û  
vekirî. Lê axa van bestana xwalîya gewre.  
Xwaliyek boz û bêber. Li vira ra qûçên  
pîrrberfe Toros wusan têne xûyanê, tu  
dibêjî qey eger tu destên xwe dirêj bikî, tu  
yê bikaribî wana himêz kî.

Dirrindest destek ji van destanaye. Li  
Dirrindestê da pênc gund hene. Gistî

nîstecîyên van her pênc gundana jî bêy  
zevî û zarin. Zevî hemû yên Evdî Begêne.  
Dirrindest digel tore û zaxûnên xwe yên  
taybetî cihaneke ji cihanê veqetiyayî. Gistî  
xelkên Dirrindestê hema ji bilî gundên

5

xwe çî derên dî nas nakin. Kêm diqewime  
ku kesek ji wan ji Dirrindestê derkeve  
derva. Li bara Dirrindestê û gundên wê û  
çawanîya jîna gundîyên wê da jî haya çî  
kesî tune. Rêya qemçûrrgirên dewletê jî  
heylo du sê salan carekê lê dikeve. Ew jî çî  
carê rû li gundîyan nakevin û digel wan  
peywendê nagirin, belkû her tenê Evdî  
Begê dibînin û diçin.

Kanîas mezintirîn gundê Dirrindestêye.  
Evdî Beg li vî gundî da rûdinê. Gund  
ketîye rojhilata destê da. Li binê zangekî  
da hatîye ava kirinê. Kevirên zangê  
kewhisinin. Hinapîrê bi rengên sîrikî,  
keskîn, zîvîn û rengên dî yên curre curre  
zang daye ber xwe. Sipîndareka pîr û bi  
gewde, ku li ber pîrbûna çiqilên wê yên

xiloxaro li ser erdê da tewîyane, eva  
çendik û çend sale, ku bi mezinatî û  
giranîyek taybet li fêza gund li ser pîyan  
rawestayê. Tu ku ta sed gezîya spîndarê, ta  
pêncî gezîya spîndarê pês da diçî, çi deng  
6

û seda nayê. Her alî li bêdengîyek giran da  
cûm bûye. Bêdengî mirovan ditirsîne. Tu  
ku ta bîst û pênc gezîya wê da jî pês da  
diçî, dîsan her wusane...Ta deh gezîya wê  
da jî dîsan heman bêdengîye. Lê gava ku  
mirov digîje kêleka darê û li rex zangê ra li  
ser darê da dizivirre, ne ji gav da her tist tê  
guherrînê. Ne ji gav da xurrînek quloz  
dibe. Mirov li ber dengê wê xwe sas dike.  
Pês da deng wusan bilinde, ku guçkên  
mirovî `kerr dike, lê pasê bere bere deng  
veditexire.

Ew cîyê ku hurmîn jê tê, serekanîya ava  
Kanîasêye. Serekanî nîne, lê gundî ji wê  
derê ra serekanî dibêjin. Ewan wusan  
dizanin.

Av li binê zinarekî ra kef li ser ketî

difîsqîne derva û gerrînekekê çê dike. Eger  
letedarek bikeve nava wê gerrînekê, yê  
rojekê, du rojan, heylo heftîyekê li ser wê  
avê lev bigerre. Hindek li ser wê bîr û  
bawêrêne, ku ava zangê dikare heylo

7

xirreberan jî li ser xwe ragire û lev  
bigerrîne. Lê ya rastî ev dera serekanî nîne.  
Av ji cîyekî dûr ji çîyayê sipî serekanîyê  
digre û li nava çamistanê ra derbas dibe û  
digel xwe bêhna pûng û rihanmerzên  
beyanî tîne. Li vira jî li binê zangê ra  
derbas dibe û li alîyê zangê yê dî ra kef li  
ser ketî, dînok û hilkelok dihurmice û  
difîsqîne derva.

Li vira ta çîyayê sipî hind zang û raz û  
rewezên bilind hene, ku Toros hindî erdê  
malikê tê ber çavan. Çamên bilind û bi  
gewde li nava zinar û rewezan ra ber bi  
asimîn hilkisyane. Li nava van rewezana  
da bêderew çî giyanliberek najî. Tenê car  
caran, ew jî gelekî kêmbayê êvaran mirov  
dikare li ser qûça zinarekî bilind sivrekî

bibîne, ku saxên xwe yên mezin û çengalkî  
li ser pista xwe da tewandîye, lingên xwe  
repitandîye û li cîhana bêbinî mêze dike.

8

2.

Kengirtûsî li hisktirîn û beyartirîn erdî da  
hisin dibe. Li axeka wekî penêri sipîçîl da  
hisin dibe. Li axekê da diberride, ku ne dar  
û ne jî çi curre gîhayên dî, heylo kerhêjîrok  
jî tê da hisin nabe. A ...li axeka weha da  
kengirtûsî serbest û mise, bê bend û bar çiq  
vedide û tûrr davêje û li beratîya çolê da  
pêsvê diçe.

Li axa bas da mirov ji derman ra jî rastî  
libek kengirtûsî nayê. Hegera wê jî yek  
ewe, ku axa bas beyar û bêkar namîne û  
herdem tê sovkirinê û ji çandinê ra amade  
dibe. Hegera dî jî ewe, ku tu dibêjî qey  
nîveka kengirtûsîyê digel axa berîner  
tuneye. Kengirtûsî li xwaliya ne wusan bas  
û ne jî wusan pîs da, û li erdên kode yên

9

navîncî da hisin dibe. Xelk kengirtûsîayn

sov dikin û dewsa wan diçînin. Panavkên  
pêsîra çîyayên Toros ta nêzîkiya birrekan  
wehane. Bilindtirîn kengirtûsî hindî gezekî  
bejin vedidi. Vêca kerîyek çiqilên wê  
hene. Çiqilên wê tijîne li kulîlkên pêncperr  
û isteyrikî. Ev kulîlkana li nava istirînên  
tûj û birrek da nin. Bi her tûmek  
kengirtûsîyê va bi sedan ji van kulîlkên  
pêncperr û isteyrikî hene. Kengirtûsî li her  
kî derê hisin bibe, yek, du, sê, çar lib hisin  
nabe, belkû wusan ser hev, ber hev û  
rixtim hisin dibe, ku mar nikare li nav ra  
bisûlike. Tu derzîyê bavêjî li ber  
kengirtûsîyan nakeve erdê. Kengirtûsî li  
danê buharê da lawaze û rengê wê keskê  
vekirîye. Eger nermebayek bê, kengirtûsî  
wusan li ber ditewe, tu dibêjî qey bi erdê  
va dibe yek. Li nîveka havînê da, pês da li  
çiqên wê da rehên sîn peyda dibin. pasê  
hêdî hêdî çiq û tûmên wê bitev sîn dibin.  
Ev sîna sînekî vekirîye...Lê sîn bere bere  
10  
xiziktir dibe. Îca ev sîna çî sînekî bedewe.



Zevîyek, destek bê ser û bin seranser sînî  
va dihingêve. Dev devî rojava, eger bayek  
rabe, dest durust wekî derîyayek sîn pêl  
vedide û dihurmice. Danê êvarê derîya  
çawan sor dibin, destên kengirtûsîyê jî  
wusan sor dibin. Berberî payîzê dirrik hisk  
dibin. Rengê wane hisin bere bere sipî va  
dihingêve. Vêca qirçeqirç li tûmên  
kengirtûsîyan quloz dibe. Hindek  
Seytanokên sipî-çîl hindî biskokan hene,  
îca li vê demê da bi sedan û hezaran ji van  
seytanokana bi çiq û bistikên kengirtûsîyan  
va dizeliqin. Vêca tûmên kengirtûsîyan xal  
xalî sipî-çîl dibin.

Gundê Kanîasê dirristane... Ne zevî lê  
heye, ne jî bax û baxçe. Erdê wê tev da  
kengirtûsîye.

Ew kurrkê ku li nava dirristanê ra  
dirrevî, bêhinçikyayî bûye. Mêjve bû, ku  
bê rawestan dirrevî. Niskava rawesta. Li  
teskên xwe nihêrrî. Ew cîhên ku dirrikan

11

dirrandibûn, xûn jê dikisiya. Nikarî li ser

pîyan raweste. Ditirsîya, ku hema hindik maye pê ra bigîjin. Tirsetirs li pist xwe ra mêze kir. Hindî çavan qeter dikir çi kes nedihate xûyanê. Sa bû. Ser milê rastê da zivirrî. Dîsan demekî dest bi revê kir. Pasê westîya. Westîyayî westîyayî li nav dirrikan da velezîya. Li alîyê çepê çavên wî li mûristanekê ket. Mêhrûyên gir û mezin, ku li ber devê mûristana xew li ser hev û ber hev ra diqilqilîn, dêhna wî li ser xwe da rakêsan. Demekî her tist ji bîr kir û mat ma li mêhrûyan temase kir. Ê gava ku niskava hate bîrê, veciniqî. Ji cî rabû, li ser milê rastê da zivirrî. Demekê sûn da li dirrikanê derket. Li rex dirrikanê li ser çokan ket. Pê hesîya, ku serê wî li ber dirrikan ra tê xûyanê. Serê xwe xar kir û vêca kundkî rûnist. Xûn gulok gulokî bi çîp û teskên wî va rêz bibû. Dest pê kir xwalî li ser birînên xwe da resand. Gava 12 ku xwalî kete ser birînan, sewat bi birînan ket.

Zinar kêmekî wêdatir bûn. Dîsan hindî  
guj û tawa wî hebû, ber bi zinaran dest bi  
revê kir. Gihîste bal sipîndara ku li bin  
bilindtirîn zinarî da bejin vedabû. Li bin  
spîndarê da korek hindî çalekê hebû.  
Pelgên zere qîçik, bînanî zêrr, bi rehên sor  
va li binê darê da li ser hev da tîx tîxî  
bibûn û bejna darê ta nîviyê veposandibûn.  
Xisexisa pelgên hiss bû. Çû xwe avîte ser  
wan pelgana. Baldarek li ser kimê çiqek  
here bilinde sipîndarê ya rût, venîstibû.  
Gava xisên bihîst, firrî û çû. Kurrik  
westîya bû. Hecirî bû. Kete sêrî, ku sev li  
vê derê li ser van pelgana biêwire. Cîhê wî  
nerm bû. Dil nedikir ji cî rabe. Pasê xwe ji  
xwe ra got: “Na nabe, dirrinde yê li vira  
mirovî bixon.”

Ew çend pelgên hiss, ku bi çiqên darê  
va mabûn, li hewale ba bûn û jor da hatin û

13

ketin ser tîxa pelgan. Pasê pelgan bere bere  
yek û yek , du û du dest bi werîyanê kirin.

Xwe ji xwe ra xeber dida. Bilind bilind

diaxift. Te digot qey kesek li bal wî heye  
ku pê ra qezî dike: “Ezê herrim, ezê herrim  
wî gundî peyda bikim. Çi kes nizane ez  
çûme wira. Ezê herrim û peyda bikim. Ez  
vaye diçim. Ezê herrim bibim sivan. Ezê  
cot bajom. Dayîka min jî bila li min  
bigerre. Bila hindî dilê wê dixwaze li min  
bigerre. Êdî rûteke jî nikare rûyê min  
bibîne. Nikare bibîne. Lê wakî ez wî gundî  
peyda nekim?! Ezê peyda nekim jî! Ezê  
birsîna bimirim. Ez vaye nêz da dimrim  
jî.”

Tava sîrogerme payîzî dar û ber û pelg  
dialast. Ax taze û ron û vekirî bû. Du, sê  
kulîlkên payîzî erd qelastibûn û hemmanê  
dixwastin derkevin derva. Bêhnek tal ji  
çirîsê quloz dibû. Çirîsa terr diçilvilî. Li  
danê payîzê çîya bêhna çirîsê didin.

14

Demjimêrekê li wir ma, yan dûyan?  
Bixwe jî nizanî. Lê tav ber bi çîyan  
disûlikî. Kurrik dest ji axiftinê kisand û  
hate ser hemdê xwe. Niskêva kete sêrî ku

li peyê wî ketine. Sêt bû. Li tavê nihêrrî.  
Hindik mabû tav biqulibîya. Ca niha yê ku  
da herre? Kî alî da herre? Bixwe jî nizanî.  
Siverêyek bizinan li pêşîra zinaran da pêş  
da diçû. Kete wê siverrêyê û dest bi  
helatinê kir. Nizanî eva dare, bere, zange  
çîye? Serê xwe xistibû ber xwe û dirrevî.  
Bas bêhna xwe vedabû. Radiwesta û li dû  
xwe ra dinihêrrî û dîsan dest bi helatinê  
dikir. Pîyên wî li hevdu dialîyan. Li gel  
helatinê çavên wî li ser darek rizî bi  
gumgumokê ket. Nizanî çima Sa bû.  
Gava ku gumgumokê ew dît, revî xwe  
avîte bin darê. Carekê tiltilî û sist bû. Pasê  
rawesta. Serê wî gêj dibû. Çavên wî resve  
tarî diçûn. Der û dest wekî zivirrokê li dor  
serê wî dizivirrîn. Dest û pîyên wî jî  
dilerizîn. Pistî wê hindê ku li dû xwe ra  
15  
nihêrrî, dîsan dest bi revê kir. Niskava  
refek kew li ber pîyên wî firrîn. Li ber  
firrîna refa kewan veciniqî. Hema li  
biçûktirîn xisênê jî veciniqî. Vêca dilê wî

dînok hildavêt. Dîsan bêhîvîyane li dû xwe  
ra nihêrrî. Li xûnê û xûyê da cûm bibû.  
Qudûmên çokên wî iskestin. Hecirî û  
vemirî xwe avête erdê. Ew cîhê ku lê  
rûnistibû panavek berdelan bû. Bêhna  
xûyek tirs jê dihat. Bêhna gulek bêhnxwes  
jî hate ber difina wî. Bi zorê karî çavên  
xwe veke. Serê xwe giran giran û tirse tirs  
rakir û li axarê xwe nihêrrî. Roj li dev devî  
ava bû. Sîber dirêj û dirêjtir bibûn. Li  
bintara xwe hemmanê çavên wî li resê  
xanîyekî more ket. Ber sabûna dil hebû firr  
bida. Li kuleka xênî ra dûkel jî derdiket.  
Dûkel nermik nermik û giran giran ji  
kulekê qulozî hewa dibû. Dûkel dûkelek  
res nibû. Rengê wê vekirî û kewhisinî va  
dihingêvî. Dengê weke dengê pîyan li dû  
xwe ra bihîst. Serê xwe bi taw zivirrand.

16

Li alîyê rastê cengel weke resêskeke rese  
tarî pil pilî ji esmanan ber bi erdê jorda  
dihat. Dîsan dest bi axftinê kir. Lê vê carê  
bilind bilind diaxift. Hem li cengelê

dirrevî, hem jî hindî hêza wî hebû, digot:  
“Ezê herrim bêjim wan ...Ezê bêjim wan  
ku...Ez hatime bibim sivanê we. Ezê bêjim  
ez dikarim cot jî bajom...Ez dikarim  
zevîyan jî bidirûm. Ezê bêjim navê min  
Mistike. Mistkê res .Ezê bêjim ne dayîka  
min heye, ne jî bavê min...Ezê bêjim Evdî  
Begê min jî tune. Ezê bêjim, ezê herrim  
ber pezên we...Ezê cotê we bajom. Ezê  
bêjim ezê bibim kurrê we. Ezê hema bibim  
kurrê wan jî. Ez nabêjim navê min  
Memedê Zirave. Ezê bêjim Ji min ra  
dibêjin Mistkê res. Bila dayîka min bigrî.  
Ez vaye dimirim. Bila Evdî Begê gawur jî  
li min bigerre. Ezê bibim kurrê wan.”  
Pasê bi kurre kurr dest bi girîna kir. Rêlê  
res û tarî dihurmicî. Hindî dikarî girîya.  
Hindî deng jê derdiket girîya. Xosina wî ji  
17  
dengê girîna wî ra dihat. Gava ku li  
panavkê jor da hat, girîna wî xirt vebirîya.  
Bi dermilkê xwe yê rastê çilma xwe paqis  
kir. Dermilkê wî bû terr û sêlav.

Gava ku gihîste hewsaxanîyê more,  
hewa lap tarî bibû. Li axara wî da resên  
koloxtên dî jî li ber çavan diketin. Gavekî  
rawesta. Nav hisê xwe da çû. Ma nabe ku  
ev gunda heman ew gunda be?! Li ber dêrî  
mirovekî rûkoyî daliqiyayî li palanekî  
dixebitî. Gava ku rûko serê xwe li ber xwe  
derxist, çavên wî bi resekî ket, ku li nîveka  
hewsî da çik rawestabû. Ewî resî du, sê  
gav ber bi wî avêt û dîsan rawesta. Mêrik  
guh nedayê. Li dû karê xwe ra girt. Gava  
ku axar lap tarî bû, êdî çavên mêrik  
nedîtin, dest ji karê xwe kisand. Rabû ser  
xwe. Gava ku li ser milê xwe yê çepê da  
zivirî, heman ew resa li cîhê wî yê pêş da  
hema wusan çik rawestayî dît:

“Lolo! Lolo!” Mêrik gazî kirê. “Lolo! çî  
karê te li vira heye?”

18

Res: „Ez...Xalo... Ezê bibim sivanê te.  
Ez dikarim cot jî bajom. Ez dikarim her  
karî ji we ra bikim xalo.”

Mêrkê rûko milê wî ra girt û ew ber bi



mal kas kir:

„Ca vêga were hundur, emê pasê li bara her tistî da biaxivin...”

Derva sirrek sar dihat. Memed li ber serma dilerizî. Wusan dilerizî, ku didanên wî li hev diketin.

Kalo gazî jinka ku li hundurr da bû, kir :

„Ardû bavêje bixêriyê, ev zarra vaye li ber serma dilerize.”

Jinkê zendegirtî pirsî: „Ew kê ye? “

Kalo bersiv da : „Mêvanekî Xudêye .“

Jinik li ber lêva xwe da kenîya û got :

„Min qet mêvanên weha nedîtibûn ! „

Kalo got : „Te nedîtibû , îca niha bibîne !

”

Jinkê berhimêzek êzing anî û yeko yeko

êzing li nav bixêriyê da li ser hev da

hilcinî. Bixêrî hêdî hêdî gurr bû.

19

Kurrik li kêleka bixêriyê aliyê çepê

rûnist û xwe kire girê û xwe bi dîwêr va

zeliqand. Serekî mezin bi kurrik va hebû.

Porrên wî yên res ku rijiyabûn ser tefesa

wî, hind li ber tava destê mabû, gevezî va dihingaft. Tefasa wî biçûk bû. Tefesek qerçimî. Çavên wî gir û qimer bûn. Lesê wî tavsotî bibû. Yanzde salî dihate xûyanê. Dirrikan sapkê wî ta çokan dirrandibû. Lew ra teskên wî rût mabûn. Pêxas bû jî. Xûn gulok gulokî bi esk û teskên wî va hisk bibû. Herçend ku bixêrî bas gurr bibû jî, lê ew hê jî dilerizî.

Jinkê : „Tifalî, tu birsîyî? Bihêle ez ji te ra sorrbayê ro kim, vexo, bila tu germ bibî.“

Kurrik : „ A, ezê vexom .“

Jinkê dest pê kir, li berosa zenge mezin, ku li raserî bixêrîyê bû, sorba sawarê berda dewrîyek zêc. Çavên kurrik zil man û li hulma ku li berosê quloz dibû, nihêrî.

20

Jinkê sorba anî û danî ber kurrik û kevçiyekî darîn jî da destê wî, û gotê : „zû zû vexo!“

Kurrik : „A, ezê zû zû vexom.“

Mêrik : „Hind jî bi lez venexo, devê te

yê bisewite.”

Kurrik : „Na, na nasewite.”

Kurrik bisirî. Kalo jî bisirî. Jinkê çî  
wateyek neda bisirîna wan.

Kalo : „Sorrbayê dema wî saz kir, sêrê  
min êdî nalerize.”

Kurrik : „Erê, erê, ez êdî nalerizim.”

Jinik jî bisirî.

Bixêrî zor bi ser û ber û simsad hatibû  
sîwax kirinê. Banê xênî jî bi herrîyê hatibû  
tepisandinê. Arrûkê xênî jî bi çirpî û alasan  
hatibû rêkxistin. Arrûk li ber hîsa çendik û  
çend salan res bibû, û ditteyisî. Xanî  
navbirr kiribûn. Alîyê dî pag bû. Hewayek  
wusan germ û nêmdar ji derê pagê ra  
dihate hundurr, ku bîzê mirovi tevî hev

21

dikir. Ewê bêhna rêxa dêwêr, kayê, û  
çirpîyên terr dida.

Ji alîyê pagê kurr, kiç û bûka kalo jî  
hatin. Kurrik bi hijmekarî xwes xwes li  
wan mêze kir.

Kalo gote kurrê xwe: „Tu çirra

serçavanîyê nadî mêvanê me ?“

Kurrik bi mijdahî û zor li ser xwe

serçavanî da mêvan :

„Ser çavan ra hatî bira, bi xêr û xwesî, çi heye, çi tune ye ?“

Kurrik jî bi heman giranî û sengîyê

bersiv da: „Zor sipas. Her bijî! Xwesîya te.“

Kiçkê û bûkê jî serçavanî dane kurrikî.

Li wê navê da kotikê li nava bixêriyê da jî bas gurr bibû, û kozî girtibû.

Kurrik destên xwe li ber hev ra kiribû, û xwe kiribû girê. Kalo hat û li rex kurrik rûnist. Gorriyên bixêriyê sîberên sosret davêtin ser dîwaran. Kalo digel wê hindê ku sergermî temaseya sîberên êgir bû,

22

hizrên li nav serê kurrik da jî dixwand.

Pistî wê hindê ku kalo li temasa sîberên gurrîyan ku li ber hej û livên alavan pêder cî diguhestin û neditebitîn, têr bû, bi bisirîn berê xwe li ser kurrikî da kir. Tefasa kalo qoq û dirêj bû. Ridîna wî top û sipî-çîl bû.

Enîya wî li ber tavê sewitîbû. Rengê zengê dida. Vêca gava ku alavên bixêrîyê davîte serçavên wî, enî, lam, û uskura wî bînanî zenga sor ditteyîsîn. Bînanî çawa ku tistekî giring hatibe bîra kalo, kalo berê xwe li ser kurrikî da kir û got: „Hero mêvano, te negot ka navê te çîye. Pirsiyar bê xewse, navê te bixêr ?“

Kurrik: „Ji mi ra dibêjin Memedê Zirav...“

Pasê bîna tistê ku ji gotina xwe posman bûbe, lêva xwe gest. Bi serm û fedî serê xwe kire ber xwe da. Ji bîr kiribû, ku li rê da gotibû : „Ezê bêjim navê min Mistikê rese. “ Pasê xwe ji xwe ra got : „De bila be, çî jê nayê. Îca Mistik kêye? Ma navê  
23

min bixwe çî jê hatîye? Ezê çima navê xwe vesêrim ?! Vira ku çî kes min nas nake.“

Kalo gote bûka xwe :

„Sifrê raxe! Em sîva xwe bixon!“

Sifre raxistin. Binemalê bi gistî tevî

Memed li dora sifrikê gerr girtin. Li ser xwerekê çî kesî qise nekir. Xwerekê xwe li bêdengîyê da xwarin. Pasê bermilek ardûyê dî jî avêtin bixêriyê da. Kalo bi xwe jî rabû, çû kotikek anî û durust li nîveka bixêriyê da cî kir. Gurrîyan li her alî kotik dane ber xwe. Eva mezintirîn dilxosîya kalo bû. Ev yekê nekira neditebitî. Gurrîyên êgir qurûsk qurûskî dibûn û her alî li dor kotikê kalo dialîyan. Kalo bi vê hindê dilxwes dibû. Jinikê li guçkê kalo da hêdîka kire piste pist: “Silo ez nivînê kurrikî li ku danêm?”

Silo dîsa bi kena xwe ya caranî xwes xwes kenîya û got: “Li axurrê bergîrê pîr da...Tu yê li ku danêy? Em bi xwe li ku

24

radizên, ciyê wî jî li wur danê...Kê dizanê ka ev mêvanê minî xosdevî ji kê derê ra bi hîviya Silo hatîye?”

Silo li ser Memed da zivirrî. Memed li ber germayê sist bibû û hemmanê dihênijî.

„Hero mêvano xewa te tê?”

Memed xwe berev kir û got: “na, xewa min nayê.”

Kalo zil ma li nav çavên kurrki mêze kir û got: “Hero Memedo te qet negot ka tu ji ku têy, û tu yê ku da herrî.”

Memed çavên xwe ku dûkel çûbûnê mizda û bersiva kalo da: „Ez li Kanîasê têm û ezê herrim gundê hanê.”

Kalo bi xem û pirsîyar got : „Em Kanîasê nas dikin, lê gelo ew gundê hanê kîjan gunde ?“

Memed bêy wê hindê ku xwe bezir bike, got : „Gundê Dursun wan.”

Kalo bi pêkutanî got : „Kîjan Dursun ?“

Memed : „Tu ku Evdî Begê nas dikî...”

25

Lê nikarî gotina xwe bidomanda. Çavên xwe kuta gosekê û mit ma.

Silo : „Êêêê, îca ?“

Memed : „Tu ku axayê me nas dikî.

Dursun heqdarê wîye. Cot dajo. Cotê Evdî axa dajo. Ez wî Dursunî dibêjim ha. „

Çavên wî biriqîn û kêmekî rawesta: „Ew

Dursunê ku cûcikeka basokan girtibû,  
ha...Îca te nasî apo ?“

Silo :“Erê, erê min nasî...Êêêêê , îca , êdî  
?”

Memed: „Erê da, ez niha diçim gundê  
Dursun wan. Dursun gote min ku li gundê  
wan da kes zarrûyan nakute. Zarran bizorê  
nasînin cot. Digot li zevîyên gundê wan da  
kengirtûsî tuneye. Ez dikim, ku herrim  
wura.“

Silo: „De base navê wî gundî çi bû?  
Dursun qet ji te ra navê wî gundî negot?“

Memed mat ma. Nav hisê xwe da çû.

Tilîya xwe ya beranî kire devê xwe û  
demeka xurt hizirî. Pasê niskava go :

26

“Nea...Dursun navê wî gundî ji min ra  
negot.“

Silo : „Sosrete ha...“

Memed jî lê zivirrand :“Erê sosrete. Min  
û Dursun me tev cot dajot. Dursun li ser  
kevirekî rûdinist û digot: Heyî te gundê me  
bidîta. Xwalî û berên wê tev da zêrre.



Derîyaya wê heye. Çamistana wê jî heye.  
Digot mirov dikare li derîyayê siwar be û  
dilê mirov kî alî bixwaze herre. Dursun li  
wur revîbû. Gote min ku li bara reva wî da  
ji çi kesî ra tistekî nebêjim. Min heylo ji  
dayîka xwe ra jî negot.“

Pasê li ser Silo da xar bû û li guçkê wî da  
got :“Tu jî ji çi kesî ra nebêje! Erê apo ? „  
Silo : „Netirse, netirse. Ez ji çi kesî ra  
nabêjim.“

Pasê bûk rabû çû û pistî qasekê bi  
çîwalekî dagirtî va ku dabû pista xwe  
zivirrî. Bûkê çîwal danî wê nîvekê. Gava  
ku devê çiwêl vekir, qozên pembo rijiyane  
nav malê. Qoze hatibûn paqis kirinê û çîl û  
27

kever bûn. Her yek bînanî gulteyek ewrê  
kever bû. Niskava hundurr xênî tijî bêhna  
tunde qozeyan bû.

Silo bi gulsayî got: „De kanê Memedê  
Zirav, pemboyan rakês ber xwe, de ka tu  
sêrekî çawayî .“

Memed bermilek pembo rapêçî ber xwe

kir û got :“Tu dibêjî ka çîye. Ma paqiskirina pembo jî kare ?“

Destên wî yên fêrbûyî wekî makînan dest bi karî kirin.

Kurrkê Silo got : „Îca Memedo tu yê niha çawa wî gundî peyda bikî ?“

Memed ku xûya bû çî xosina wî ji vê pirsê ra nehatibû, keserek kûr rahêla û got:

“Ezê lê bigerrim. Derîya li rex wî gundî heye. Ezê lê bigerrim. „

Kurrik: „Hero Memedo ji vira ta derîyayê rêya panzde rojane.“

Memed: „Ezê lê bigerrim. Ez bimirim jî ez êdî lingê xwe navêjim Kanîasê. Ez êdî çî caran nazivirrim.“

28

Silo hilda û got: „Hero Memedo tistek hatîye serê te. Te negot ka çî hatîye serê te, ku te weha serê xwe hildaye, tu li çil û çîyan ketîyî ?“

Destên Memed sist bûn: “Apê Silo raweste ezê hemûyê ji te ra sirove kim. Bavê min mirîye.Tenê dayîkek min heye.

Êdî çi kesê min tune. Ez cotiyarê mala  
Evdî Begême.“

Gava ku gihîste vira, çavên wî tijî bûn.  
Gewrîya wî sewitî. Bi zorê karî xwe ragire.  
Eger li ber xwe neda, kela girîyê dabû  
qirrka wî, yê kûrrîn lê da bigirîya. Memed  
dûmaya gotinê xwe ra girt :

„Eva du salin, ku ez cot dajom.

Kengirtûsîyan ez dixwarim. Dirrkên  
wê...Dirrkên kengirtûsîyê bînanî san  
mirovî digrin. Ez li zeviyek wusan da cot  
dajom ha...Evdî Begê her roj ez ji mirinê  
ra dikutam. Duh sibêdê jî dîsan ez kutam.  
Seranserî lesê min hecirand. Ez jî ji wur  
revîm. Ezê herrim wî gundî. Evdî Beg

29

nikare min li wî gundî da peyda bike. Ezê  
li wî gundî da bibim cotkarê yekê. Yan jî  
ezê bibim sivanê yekê. Eger hez bikin ezê  
hema bibim kurrê wan.“

Gava ku got ezê hema bibim kurrê wan,  
zil ma li nav çavên Silo mêze kir.

Memed pingirrî bû. Wakî devê xwe

vekira û peyvek dî jî bigota, yê bînanî  
dîzka danûyan bibijiqîya.

Lew ra Silo çîrroka Evdî Begê guhest :  
„Ca vir da kanê Memedo, wakî dilê te  
naxwaze tu bizivirrî Kanîasê, hema li bal  
me bimîne.“

Tefesa Memed biskivî. Pêlên sabûnê  
serdanpîyê wî lerizand.

Kurrkê Silo: “Memedê Zirav derîya  
gelekî dûre. Ew gunda jî hema wusan  
sanahî nayê peyda kirinê.“

Paqiskirina pembo kuta bû. Nava xênî  
tijî ispikên pembo bibû. Ispikên rese biçûk,  
ku lezo bezo bi elepe li ser hev û ber hev  
ra dihatin û diçûn. Destek nivînê biçûk jî li  
30

rexekî bixêrîyê danîn. Çavên Memed  
guhan kiribûn. Bi hijmekarî û xwazîk dîna  
xwe dida nivînan. Mêjve bû, ku Silo bi  
rewsa Memed hesîyabû. Nivîn bi tilîya  
xwe nîsanî Memed da û got: “Bikeve nav  
nivînê xwe?”

Memed bêy wê hindê ku tistekî bêje,

xwe kire girê û xirpisî nav nivînan. Çokên  
xwe himêz kir. Te digot qey lesê wî di  
conî da kutane. Seranserî lesê wî diêsîya.  
Memed li dilê xwe da: „Ezê hema bibim  
kurrê wî. Erê ezê hema bibim kurrê wî.  
Dayîka min jî bila li min bigerre. Evdî Beg  
jî bila li min bigerre. Ca bila li min  
bigerrin. Hindî dilê wan dixwaze bila li  
min bigerrin. Ez êdî nazivirrim.“

Du demhejmêran berî tav lêdanê, durust  
li dema ku her roj diçû cot, ji xew  
hilpekîya. Li nav nivîna derket, çû derva.  
Hema wusan xewar xewar li derva sipêkî  
mîst. Pistî hînga hate ser hemdê xwe. Sevê  
dinê û Silo yê ridênsipî hanî bîra xwe. Li  
31

dilê xwe da got: „Mala apê Silo! Ezê hema  
li vir bimînim. Ezê herrim wî gondê hanê  
çi? Ezê hema bibim kurrê apê Silo. Ez êdî  
venagerrim. „

Li ber sirra derva lê sar bû. Dîsan çû kete  
nav nivînan. Ser ji nû çokên xwe himêz  
kirin. Nivîn germ bû. Dizanî îro ta

tavlêdanê dikare razê. Vêca dîsan jî xew ra çû.

Pistî sirra sibêdê tavê zeliqandê. Dadê sorrba li ser êgir hilanî. Hulmek bêhnxwes ji sorrba germ ku li rex bixêrîyê bû, quloz dibû. Kurrikê Silo mêjve bû, ku çûbû cot.

Silo jî li ber kurtên rûnistibû, karê pînekirina kurtên, ku sevê dî nivîskan mabû, ser ji nû dest pê kiribû.

Jinkê gazî Silo kir û got :

„Silo sorrbe sar bû, were sorrbaya xwe vexo.“

Silo pirsî : „Mêvan rabûye?“

32

Jinkê got: „Tifalî ...Dîyare duhûnê gelekî westîyaye. Sevê dî hema li ber bestan dipeyvî.“

Silo: „Deng lê neke! Belengazî, ji tefesa vî ra dîyare, ku duhûnê hema pêder helatîye.“

Jinkê pirsî :“Gelo çira revîye ?“

Silo bersiv da : „Dîyare gelekî zorgivisk danê.“

Jinkê: “çi zarrikek xweskoke jî. Bêdînan  
ji vê lepa zarrokê çi dixwazin?!”

Silo: „Hindî dilê wî dixwaze bila li mal  
da bimîne.“

Li vê navê da Memed bi bawûsk ji xew  
rabû. Pistî wê hindê ku bi her du destên  
xwe çavên xwe mizdan, çavên wî li  
bixêriyê ket. Ji sorrba ku li berosa  
dervekirî da bû, hulmek sivik quloz dibû.  
Berê xwe li ser dêrî da zivirrand. Li qesa  
dêrî ra tîska tavê bînanî qeytanekê, ku bi  
kêrikê hatibe birrînê, dabû nava xênî.  
Niskava li nav nivînan hilpekîya derva.

33

Gava ku Silo ew hejûliva ji Memed dît,  
gotê:

„Netirse berxê! Wakî dilê te dixwaze,  
dîsan jî tu dikarî razêy.“

Memed zivirî û ew lûlengê zeng ku li  
rex bixêriyê bû, hilda û çû derva. Pistî  
hînga ku serçavê xwe bi aveka pirr sût,  
hat û li ser serê Silo ra rawesta. Dest pê kir  
li Silo û pînekirina palên temase kir.

Jinkê dîsan gazî kir: „De werin sorrba waye sar dibe. Werin sorrbaya xwe vexon!“

Silo ji ser kurtên rabû, kincê xwe dakuta û çavê xwe li Memed niqand û bi lêvken gotê: “Bibeze, em herrin sorrbaya xwe vexon!“

Sorrba, sorrbesîra sawarê bû. Bêhna sîr û sawarê tevî hev bibûn û bêhneke xwes afiraniyê. Sorrba bi kevçikên darîn vexwarin. Xosina Memed gelekî bi sorrbayê ra hat. Di dilê xwe da got: „Ezê hema bibim kurrê vana .“

34

Pistî tastê Silo karê pînekirina kurtên kuta kir. Vêca bi dest pûs û pelas ditemisande hundurrê palên. Pûs li nav qetên tilîyên wî yên pîr û dirêj da vî alî wî alî disûlikîn.

Tava payîzî bi gist teyîsînê va cihan dagirtibû. Gava ku Silo pûs ditemisande hundurrê palên, tozek zere zirav jê quloz dibû. Toz li ber tirîskên tavê diteyîsî û



belayî axaran dibû.

Silo: „Evdî Begê gelekî tu diêsandî, nê?“

Memed ku li hêviya pirsiyarek weha da nibû, xwe berev kir û bersiv da: „Ez ji mirinê ra dikutam... Min hem pêxasî li nav kengirtûsîyan da cot dajot –Ew jî li ber sirr û seqema payîzê- hem jî ez ji mirinê ra dikutam. Carekê wusan ez kutam, ku ez mehekê li nav nivînê derneketim...Dayîka min digot wakî nivista mela qîço neba, ezê bimirama. Ew li hemûyê dide, lê gelekî li min dide.“

Silo: „De base, tu yê li bal me bimînî?“

35

Memed: „çi karê min li wî gundî tune. Hê ew jî rêya panzde rojan ji vira dûre. Ji min ra çi ku derîyaya wî heye. Wakî kengirtûsî li wur tunebe, li vira jî tune. Ezê hema li vira bimînim. Kes nikare li vêderê min bidozeve. Ma wusan nîne!? Li vira ta Kanîasê duniyayek rêye. Kes nikare li vêderê min peyda bike. Ma na?“

Silo: „Lolo pêzevengê sêt! Aha Kanîas

vaye li pist vî çîyayî daye. Ma rêka ku tu lê hatî, tu nizanî çeqase!?

Memed zendegirtî li cî da wehimî. Çav lê fire bûn. Xûyî da. Gistî hîvî û armancên wî bûne nexs û nemûsên li ser avê.

Surresurra xûyê bû, ku ji ser û lesê wî dikisîya. Xwast ku tistekî bêje, lê tûk li gewrîyê da mirçiqî. Tûka xwe qurtve kir û tistek negot. Li hewale eluhan gerr lê didan. Gava ku çavên wî li eluhan ket, xwe ber bi Silo kisand û got: „De ya bas ewe ku ez herim wî gundî û bibim kurrê wî

36

mêrikî...Eger Evdî Beg min bibîne, yê min bikuje.“

Silo bi tan û niç got: „De herre wî gundî, herre bibe kurrê wî mêrikî, herre...“

Memed: „Wakî ez bibama kurrê te, yê çawa bas ba, lê...“

Silo: „Lê, çî?“

Memed: „Wakî min peyda bike, ji Xudê jî natirse. Yê min pirtî pirtî bike.“

Silo serê xwe li ser kurtên rakir û got:

„Çi tist ji destê min tê Memedo?“

Silo ev peyva got û ji ser karê xwe rabû,  
çûrre çûrre li Memed nihêrrî. Tefasa  
Memed wekî pelgek hisk qerçimî bû.  
Ronahîya çavên wî temirî bû. Te digot qay  
çavên wî ronahîya xwe ji dest dane. Gava  
ku Memed bera xwe dayê, Silo li wî mêze  
dike, xwe lap nêzîkî wî kir û bi destên wî  
ra girt û gotê:

„Lê yê çawa be!?“

37

Memed gistî hîvî û armancên xwe li  
çavên xwe da berev kir û çûrre ma li Silo  
nihêrrî.

Silo: „Netirse Memedo!“

Memed digel tirs û sabûnê taletal kenîya.  
Pasê Silo karê xwe kuta kir û rabû ser xwe  
û gote Memed:

„Memedo ez debê, ku ta wê mala pêsber  
herrim. Karê min li wêderê heye. Tu jî dilê  
te çî dixwaze bike. Eger hez dikî, herre  
nav gund, ji xwe ra bigerre. „

Memed ji wî qetîya û kete nava gund. Ev

gunda gundekî bîst-bîst û pênc malî bû.  
Derûban hemû more bûn. Hindek kevir jî  
hema wusan nerêkandî û qestomesto bi  
navê dîwaran li ser hev da hilcinîbûn û  
xîmê xanîyan li ser wan da danîbûn.  
Bilindaya xanîyan bi zorê dibû gezekî.  
Ser û binê gund gerrîya. Zarûyan li ser  
gastîne darçitanê dileystin. Jin li pêş dergê  
xanîyan li ber tavê rûnistibûn û rîs dirîstin.  
Seyek jî dît. Segî dûlka xwe kiribû nav

38

lingên xwe û tirse tirs li rex dîwarekî ra  
derbas dibû. Her aliyê gund tijî tepik,  
kerme û peyîn bû. Ta êvarê malo malo li  
nav gund gerrîya. Çi kesî ji wî nepirsî ka ji  
ku hatîye û yê kuda herre. Lê wakî gundê  
wan ba, yekî nenas li ber çavan biketa,  
zarrû hemû lê berev dibûn. Lê mirovên wî  
gundî currekî dî bûn... ji vê yekê xosina wî  
nehat.

Gava ku zivirî malê, li himberî xwe Silo  
dît. Silo jê pirsî:

„Hero Memedo te çira qet serek li mal

nedaye? Li nava gund qet çi hebû?“  
Memed: “xwesîya te, tistek tune bû.“  
Pistî hînga ta çend rojên dî jî Memed  
hema wusan li nav gund gerrîya. Du sê  
heval ji xwe ra peyda kirin û digel wana  
darçîtanê dileyst. Li vê leyzê da çi kes  
nedibû cigirê wî. Lê Memed li ser xwe va  
nedihanî û li ber vî hunurê xwe li ber xwe  
ra nedîçû. Eger li dewsa Memed zarrek dî  
li vê leyzê da sarezatîyek weha ji xwe

39

nîsan bida, bêy gotin yê gelekî li ber xwe  
ra biçûya. Lê Memed te digot qay vê leyzê  
gelekî zarrokane dihejmêre. Qet çi giringî  
nedida serdan û derdana wê. Li ber vê  
yekê jî hema xosina zarrokan gelekî ji wî  
dihat û torrândina darçîtanê hind li zora  
wan nedihat.

Pasê barana payîzî ya Toros dest pê bû.  
Li xezelwera payîzê da pelg çawan ji daran  
diwesin, barana payîzî ya navçeyên Toros  
jî bi giratîya pelgên xezelwerê dikevîne  
erdê.

Birûskê deng vedida û ewr dihurmîyan.  
Kevir ji çîyayê fêza malan dibijiqîn û ber  
bi destê girrêl dibûn. Çîya bi dar û bar bû.  
Darên wî çîyayî mezin û bi gewde û rixtim  
bûn.

Memed rojekî hate bal Silo û gotê: "Apê  
silo hewika min nayê. Ezê ta kengê weha  
bêkar bimînim û nanê bêtune bixom?"

Silo: „Lezê meke Memed! Bibê nebê  
emê destên te jî bi tistekî va bend bikin. „

40

Baran çend roan bend bû. Tav li ser zang  
û zinar, ax û pelg û darên nêmgirtî da birr  
birrî diteyisî. Hulmek sivik ji erdê radibû.  
Îca bêhna tepik û kerme û pêhîn digel wê  
hulmê belayî axaran dibû. Carcaran jî  
ewrên zîvîn tav dinixavtin.

Memedê Zirav li ber derê xênî li ser  
berekî rûnistibû û ew çarixên ku Apê Silo  
jê ra bi çermê xav dirûbû, pê fikir. Çarix  
nêmgirtî bûn. Pirçeke kew rûyê çarixê  
veposanibû. Ji vê pirçê ra dîyar bû, ku  
çarix ji çermê paroneyekî hatîye dirûnê.

Memed ji ber sabûna çarixan dil hebû  
firr bida. Silo hat û li raserî serê Memed  
rawesta û li çawanîya girêdana bençarixan  
ku Memed girê dida, temase kir. Destên  
Memed li grêdana bençarixan da fêre bûn.  
Ewî bençarix zû zû li hev derbas dikir û li  
pist panîya xwe da girêdida.

Silo: „Hero Memedo tu li grêdana  
bençarixan da jî hostayî ha!..“

41

Memed serê xwe rakir û bi bisirîn  
got:“Apê Silo ez dikarim çarixan çê kim jî.  
Lê te ev çarixana bas dirûye.

Memedê Zirav rabû ser pîyan û carekê,  
du caran giranîya xwe avîte ser vî pîyî û  
pîyê dî û çarixên xwe teqî kirin. Pasê deh  
panizde gavan çû û hat. Dîsan digel  
pêgermoka li çarixên xwe nihêrrî û  
heyirî. Pasê hat û li kêleka Silo rawesta û  
got:“Apê Silo hema pîyên mi ra nin.”

Silo û Memed pêkve bi rê ketin. Memed  
hema wusan çavên xwe kutabûn ser  
çarixan. Carcaran jî radiwesta, ta kû

çarixên xwe bastir bibîne. Carinan jî xar dibû, pirça ser rûyê çarixan bi dest tûmar dikir.

Silo bi sabûna Memed ra sa dibû:“Tu dibêjî qey xosa te ji wan ra hat Memedo!”

Memed bersiv da:“Hema pîyên mi ra nin. Gelekî xosina min bi çarixên weha ra tê.”

42

Silo:“Memedê Zirav wakî tu biçûyay wî gundî çî kesî ji te ra çarixek weha nedidirût.”

Memed:“ Ma li wî gundî da xelk solikan li pê nakin?”

Memed ev pirsiyara hindekî ji sadetî û hindekî jî ji qiliftî va kir. Lê Silo hilneda û got:“ Çi ra ? li wura xelk çarixan li pê nakin, belkû solikan li pê dikan.”

Memed got:“ Min zanî apo.”

Bi pegermok ji gund derketin. Niskava dilê Memed vebû. Zevî û zar ta qontara wî çiyayê hanê, ku dûr va dihate xûyanê, berve çûbûn. Ev zevîyana hind kêr



nedihatin. Kengirtûsî li van zevîyana da  
tunebû, lê hind jî zevîyên pesindanê nibûn.  
Zevîyên bi rend û kas bûn.

Memed gavekî rawesta û got: "Apê Silo  
em hema weha ku da diçin?"

Silo got: "Em derketine gerrîyanê."

Memed ser venekir. Dîsan li rê ketin. Li  
rê da herrî peskîya çarixên Memedî yên

43

nû. Memedî di dilê xwe da dujîn dane wê  
herrîya ku peskîyabû ser çarixên wî.

Gund dûr va mabû. Ji bilî çend zîvalên  
dûkelê, ku li hewa da ba dibûn, çi tist ji  
gund nedihate xûyanê.

Silo got: "Memedo guçkên xwe bide  
min! Tu yê her roj bizinan bînî vira  
biçêrînî. Tu dikarî ta wan derên han jî  
herrî. Lê nebî nebî tu ji wî girikî, ji wî  
girkê gevez derbas bibî. Ew ber bi  
kewsenê gundê we diçe... Tu yê niskava  
bibînî ku ewana hatin û tu girtin û birin."

Memed: "Bas bû ku te got, ez pîyên xwe  
wî alî da navêjim."

Silo got: "De base, were em bizivirrin."

Zivirrîn. Ewrên kever li asimîn da lev digerrîyan. Dewsa coxînan wekî guroverrkên keske xizik birr birrî li nav zevîyên bi xîstorr da belaw bibûn.

Seytanok jî tek û tek bi bistikên gîhayên bilind va zeliqî bûn.

44

Silo: "Hero Memedo Evdî Begê rûteke gelekî tu diêsandî ne?"

Memed rawesta. Silo jî rawesta. Memed carek dî li ser çarixên xwe da mêze kir.

Silo: "Em li vira rûnên!"

Memed: "A, em li vira rûnên apo!" Îca psê sirove kir:

„Apo bihêle ez ji te ra bi hûrgilî bêjim.

Bavê min ku mir, Evdî Begê dar û nedar,

heyî û neyê me hemû ji me istand. Eger

dayîka min tistek bigota yê bikusta. Ez jî

digirtim û divirrvirrandim û li erdê didam.

Carekî du rojan ez bi darekê va girêdam û

tenê hîstim û çû. Ew jî li nîveka havînê da.

Du rojan pasê dayîka min ez peyda kirim û

ji darê vekirim. Wakî dayîka min ez peyda nekirama, gurgan ez xwaribûm.,, Silo keserek kûr kisand û got:“ Dey bêje, ew jî wusan.“

Û bi gotina xwe ra ji cî rabû û got:“Ji bîra te neçe ha, pîyên xwe nevêje pist topkê gevez. Tu yê hînga pê bihesî, ku tu 45

dîtin û çûn gotin Evdî Begê. Îca hînga çi tist ji dest me nayê. Yê werin û te bibin, herrin.“

Memed:“Na, na. Ez pîyên xwe wî alî da navêjim.“

Sibetirê Memed gelekî zû ji xew rabû. Li nav nivînan derket û baniz da derva. Hêsî bere bere gewir dibû. Çû li ber serê Silo rawesta. Silo li xew da dikire xurre xurr.

Silo ji xew rakir. Silo çavên xwe vekirin û hêdîka pirsî: “Çîye? Tuyî Memedo! ,,

Memed bi sanazî bersiv da: „A, ezim.“

Pasê rawesta û got:“Apê Silo derenge.

Ez dikim ku bizinan berdim.“

Silo zû ji nav nivînan derket û çavên

xwe li jinkê gerrand. Jinik mêjve bû ku ji  
xew rabibû û li derva çêlek didot. Silo gazî  
jinka xwe kir: "Zû bike ratiba Memedê  
Zirav amade bike."

Jinkê destên xwe yî sîr li nav sîtila  
mezine avê da sûst û got: "Her çi mabe jî  
ezê êvarê bidosim."

46

Li avxwarinekê da ratiba Memed danî û  
ji wê sorrbeya ku li ser bixêriyê dikelîya,  
hindek sorrbe jî ji Memed ra rokir û danî  
ber. Memed li qasekê da sorrbe kisande  
qafê xwe û li çavgirtinekê da destexana  
ratiba xwe li pista xwe girêda û bizin dane  
pêsiya xwe. Kumê xweyê qirêc û dongirtî  
ji serê xwe rakir û kevkîyî bizinan kir û  
bizin bi yeèe yeè ber bi lewergehê hajot.  
Silo li dû ra gazî kirê: "Bi pê û palekî  
pîroz Memedo!"

Ta dema ku Memed û bizin bi Silo va  
dihatin xûyanê, Silo hema wusan li pist  
xwe ra dizivirî û li wan mêze dikir. Pasê  
xwe ji xwe ra got: "Heyî...zarotî."

Jinka wî hate bal û gotê:“Dîsan çîye?

Dîsan çî bûye, tu wayî xwe ji xwe ra  
dibilînî û diderdînî?”

Silo keserek kisand û got:“Ca bera xwe  
bidê, kê dizane ka Evdîyê rûteke çî anîye  
serê vî zarrokî. Dilê mêriv jê ra pirtî pirtî  
dibe. Min bavê wî dinasî. Mirovekî

47

belengaz û li bera xwe da bû. Ca dîna xwe  
bide vî zarrokî lo! Gelo çî anîne sêrî, ku  
serê xwe hildaye û li çolê ketîye û penah  
birîye bo dirndan. Ca lê binêrre lo!...”

Jinkê:“Tu jî hema her tistî dikî kul dixî  
dilê xwe da.. were sorrba te sar bû  
...were!...”

3.

Nêzîkîya rojava bû. Cotkar hemû ji nav  
zevîyan û li ser karên xwe zivirrîn. Lê  
Memed nezivirrî. Ro çû ava. Lê Memed  
nehat. Hewa tarî bû jî, lê Memed hê jî  
nezivirrîbû...

\*\*

MERIVÊN REBEN

DOSTOYEVSKI

MERIVÊN REBEN

ROMAN

Weinên Hesênê Metê

WEŞANÊNWELAT

Stockholm1991

Weşan: 8

MERIVÊN REBEN

Çapa yekem

Evpirtûka,

li ber wergerên tirkî û swêdî hatiye wergerandin.

Ewpeyvik û hevokên ku li ber van herdu wergeran li hev ne kirine, li ber rûsiya Marîna Ezîz Taloyanê hatine rastkirin.

© Weşanên Welat

Pergala berg û rûpelan: Bûbê

Wêneyê berga pêşîn: Fûad Alî

Portreta berga paşm: V.G.Perov -1872

ISBN: 91-97 12 54- 8-2

DOSTOYEVSKÎ

Fyodor Dostoyevskî di 30ê payîza paşîna sala 1821ê de li Moskvayê tê dunyayê. Di vê demê de bavê wî li vir di nexweşxana xizanan de doktor e. Li hêleke hewşa vê nexweşxanê xaniyekî piçûk ji bo malbata Dostoyevskiyan amade dibe.

Dostoyevskî ji xwe mezintir birayekî xwe î bi navê Mîxayîl heye û wek xweng û birayên malê, heft kes in. Diya Dostoyevskî ji malbateke dewlemend e, baqil, dilovan û xwînşêrîn e.

Lê bavê wî merivekî hişk, çikos û bi cireke naxoş e. Di malê de hertiştî bi ya xwe dike û daxwaza dilê wî her li ser wê yekê ye ku bibe dewlemendekî malmezin û xwediye erd û wargehan. Heta derekê vê daxwaza xwe bi cî tîne û H rojhilatî Moskva, tev du gundan bi qasî du sed koleyan bi dest xwe dixîne. Bi alîkariya vê hebûna bavê xwe Dostoyevskî di duwanzdesahya xwe de dest bi dibistana dewletê dike û piştî wê jî li Petersburgê dest bi dibistana avahîzaniya leşgerî dike. Hîn di vê dema xwendekariyê de bala wî U ser edebiyatê ye. Ji hevalên xwe bêtir, nêzîkiya wî û pirtûkan bi hevdu heye. Şevên nivê şevan ji nav nivînên xwe radibe, xwe vedikişîne aşxana dibistanê, dixwîne an jî dinivisîne. Ji romantîzmê heta realîzmê baş têdigêhîje; Balzac, George Sand, Hugo, Pûşkîn, Gogol, Dickens dixwîne û nas dike. Nivîskarî, hîn di wê demê de bi wî ve xuya dibe. Lê di wan nêzîkan de diya Dostoyevskî di çelsa Uya xwe de dimire (1837). Piştî vê yekê bavê wî vedigere ser wargehên xwe û zû di bin ve dibe, bi ser nakeve. Herweha xwe dide ber vexwarinê, dest davêje jinên kolê xwe, zordariyê H wan dike û heta ku di sala 1839an de ji hêla kolên xwe ve tê kuştin. Meriv baş têngêhîje bê ev kuştina bavê vî çî bandorê li Dostoyevskî dike, lê bêguman şop û pirêzên van tevgerên bavê wî di berhemên wî de xuya dikin. Di sala 1843an de dibistanê xelas dike û dibe efser. Weke avahîzanekî leşgerî heta salekî kar dike, dûre dev jê berdide û dikeve pey xeyalên ramanên xwe. Di binê şevsîpiyên havîna Petersburgê de dîrûdirêj digere, asimanên gwînvemirî, sî û reşayiya ku ronahiya şevê li ban û dîwarê kuçan û U qeraxê pirên Petersburgê, H ber çavên wî weke pîrebokan ne. Reş û

sipî tevHhev e. Di wersirên van kuçan de Dostoyevskî U pey tîpên tenê ye, xwe di jiyana wan de nîgar dike. Dostoyevskî van xeyalên xwe yê xortaniyê dûre di Şevên Sipî de (1848) û di Dilekî Tenik de dihûne.

Romana xwe ya pêşîn, hîn di dema xwendekariya xwe de H ser dixebite. Piştî ku ji kar vediqete jî car bi car wê dinivisîne û dinêre ku her car jî xweşiktir dibe. Di rojê buhara paşîna sala 1845an de Merivên Reben jê derdixe. Destnivisa wê ji hevvalê xwe yê kevn û efser î bi navê Grîgorovîç re dixwîne. Ev berhema pir bi Grîgorovîç xweş tê, wê şevê destnivisê digu-e û diçe ba Nekrasov. Ew û Nekrasov dor bi dor ji hev re bi deng dixwînin û di xwendina rûpela dawîn de hêsiyê bi çavên herduyan jî dikeve. Kurteşeva Petersbûrgê U ber destê sibê ye. Berê xwe didine mala Dostoyevskî, wî ji xew radikin, Nekrasov wî hemêz dike, pîrozbayî û serketinê lê dike. Ev yeka bandoreke wusa H Nekrasov dike ku ji vê dilpekiya xwe destnivisa Merivên Reben digire û rasterast berê xwe dide ba rexnegirê wê demê Belînskî. Belînskî dixwîne û ji bandora Merivên Reben nafihte. «Gogolekî nû bi ruyê Rûsiyayê dikeve.» dibêje û dixwaze tavilê Dostoyevskî bibîne. Lê ji bo Nekrasov gelekî dijwar dibe ku ew bikani be Dostoyevskiyê şermok serwext bike ku ew û rexnegirê mezin BeUnskî hevdu bibînin. Lê BeUnskî bi pesn û dostaniya xwe, şermokiya wî ji ser radike û Dostoyevskî wê şevê bi sermestî û dilekî xweş vedigere maiê. Dûre U derekê çêUvê yekê dike û dinivisîne ku ji bextiyartirîn demên jiyana wî yek jî ev dema ha bûye. BeUnskî û kesên H dor ateîzma wi, kêfxweş dibin ku ji bo tekoşîna wan hevvalê din peyda bû. Lê dûre bi derketina



berhema wî ya Wekhev (1846) dide xuyakirin ku DoStoyevskî H ser vatiniya huner bi awakî din difikire û bi xwe jî merivekî humanîst e. Hiş û aqilê wî li ser duduliya meriv, di navbeyna rastî û fantasiyê de bi êşeke giran diqepije.

Lê pesnên ku BeUnskî li serMerivên Reben ji bo Dostoyevskî dabû, têra wî dike ku ew jî beşdarî ci\anên salonên Uteraturî bibe, pîrozbahî lê bibarin û navûdengê wî were gotin. Tê gotinê ku Dostoyevskî ji vî navûdengê xwe sermest, qure û pozbilind dibe. Di salonan de bêdeng e û hertim mijûU xwe ye. Lê dema ku dipeyive jî gelekî ji xwe razî ye û dorê nade kesekî. Ev tevgerên wî nerihetiyê U yên dora xwe peyda dike û bi taybetî jî Tûrgenyev, wî wek zimandirêjekî naşiyê salonan bi lêv dike. Ev yeka jî di jiyaneke dûrûdirêj de dibe sedemê naxoşiya di navbera wî û Dostoyevskî de. Piştî gelek salan Dostoyevskî di berhema xwe ya bi navê Cinina (1871-72) de, bi niviskar û lehengê xwe î Karmazînov portra Tûrgenyev wek pozbiUndekî serjinik nîg^u- dîke.

Dûre Dostoyevskî ji kesên dor Belînskî vediqete û beşdarî grûba Petraşevskî dibe. Petraşevskî utopîstek e. Di bin bandora utopîstên fransî û bi taybetî jî ya Fourîr de ye. Her rojên îniyan grûbeke xort U mala xwe dicivine ser hev, ji biU xwendma nivisarên edebî û felsefî, desthilatiya Rûsiyayê, sansura çapemeniyê, rewşa xelkê û H ser nûkirina van hemû tiştan tê peyivîn. Peyivînên di van civînan de ji daxwazên xeyak zêdetir naçe. Ji beşdaran gelekî wan bi awakî naşî û zarokane ji reformên pratîk bêtir, daxwaza bihuşteke dikin ku li Rûsiyayê ava bikin. Haya dezgehên poUsên wê demê jî ji vê yekê heye. Ji ber ku ew vê aksiyonê ji xwe re xeteriyeye mezin nabînin,

dengê xwe nakin. Lê dîsa jî sixurekî xwe î bi navê AntoneUî dişînin beşdariya van civînan ku raporê berhev bike. Edî AntoneUî jî mîna ku yekî ji wan be, di van civînan de carina pêşniyarên reformên pêwîst dike.

Dostoyevskî dinêre ku Petraşevskî merivekî zimandirêj û devsistekî bêkêr e. Ji beşdarên van civînan hevaleyê wan î bi navê Speşrov heye ku Dostoyevskî pir bawerî pê heye. Lewra kuştin, mirin û serhildan çavên Speşrov natirsîne û bi her awayî şoreşgerekî dilpêt û dilsoz e. Dostoyevskî pêşniyarê wî dike ku ji pênc şeş dUêrên dilsoz grûbeke piçûk û bi dizî ava bikin ku tew bila haya Petraşevskî û kesên din jî jê nebe. Lê pêre nagêhînin. AntoneUîyê sixur bi polîsên Çarê wê demê Nîkola I. dide zanîn ku Dostoyevskî di buhara navîna 1849an de nama BeUnskî, nama qedexekirî di ci\anê de xwendiyê. Nama ku BeUnskî di wextekê de ji Gogol re şandiye û tê de rexnên giran lê kiriye ku çima Çar, dêr û koledarî tê parastin. Ya rastî, dîtinên Dostoyevskî ne bi rexnên Belînskî re ne. Tenê li ser beşa koledariyê dîtinên wî û Belînskî H hev dikin. Piştî xwendina vê namê rapora ku H ser vê grûbê û xebatên wê berhev dibe, ji Çar Nîkola I. re tê şandinê. Bi fermana Nîkola I. di 23ê buhara navîna 1849an de, tev Dostoyevskî 33 endamên vê grûbê tene girtin û hemûyan dişmin kela Peter-Paulê. Safîkirina karê vê grûbê heşt mehan dikêşe. Di bin vê çavdêriya polîsên Çar Nîkola I. de ji bo xelasiya hevalên xwe çî ji destê Dostoyevskî tê, ew dike. Tiştê ku Dostoyevskî pê sûcdar dibe ev e ku: «Rexne H sazgehên dewletê kiriye, H hemberî sansur û koledariyê rabestiye, di civînekê de nama Belînskî xwendiyê.» Dostoyevskî di binê çavdêriya poUs de

van hemû tiştan jî H xwe datîne û nabêje, na. Lê weha dibêje: «Ku herkes ji ber ramanên xwe yên bi dizî û ji ber tiştên ku di ci\anên hevalên xwe de dibêje, cûcdar bibe; ma kî ê neyê arihandin ku!»

Di binê çavdêriya poUs de deUl nayêne dîtin ku girtî bi cezayên giran werine arihandin. Di 22ê zivistana pêşîn de girtiyan ji wir dûrdixin û dibin. Ev girtiyên ha wer bawer in ku ew ê wan bişînin Sibîryayê û U bajarê Omskê bi karê zorê werine arihandinê. Lê ew xwe U qada Semyonovskê dibînin û H ber çavên sê çar hezar kesan biryara mirina wan tê xwendinê. Piştî vê biryarê, metranek tê û bi wan dide zanîn ku ew bi gunehweşîni xwe ji bo mirinê amade bikin. Wê çaxê Dostoyevskî bi dengê nizm ji hevalemê kêleka xwe re dibêje: «Ne gengaz e ku ev yên ha bixwazin me îdam bikin.» Lê hevalê wî tabûtên H jêra qadê nîşanê wî dide. Li ser vê yekê hemû girtî jî bawer in ku ev biryara mirina wan rast e û ew ê werine îdamkirinê. Nayê ser hişê kesekî ku dêr û metran jî beşdarî komediyeke weha bibin. Kirasên îdamê H hemû girtiyan dibe, çavên sê kesên pêşîn têne girêdan û bi berepaşî bi singan ve têne şidandin. Leşgerên çekdar H pêş wan cî digirin, lûlên tivîngên xwe ber bi wan dirêj dikin û U bendî fermana gulebaranê ne. Ev gav û ev bergeha, bandoreke wusa U Dostoyevskî dike ku heta dawiya jiyana wî jî ew ê her bi wî re bijî û di berhemên vn de werine hûnandin. Lê gulebaranê nabe. Piştî gavê efserekî fermanê dismalê dileqîne û tê dide zanîn ku Çar Nîkola L ev girtiyên ha ji mirinê bexişandine û ceza wan daxistiye ceza karê zorê. Ev jî metodeke çavtirsandinê ye ku bi daxwaza Çar U dar ketiye. Çi dibe bila bibe, lê Dostoyevskî

piştî bîst salan ji jina xwe re çêlî bextiyarbûna xwe ya vê gavê dike. Gelek hevalên wî di vê rewşê de xemgjn dikevin û jê yek

jî dîn dibe.

Dema ku dîsa vedigerin zindanê, Dostoyevskî ji birayê xwe re weha dinivisîne: «Êdî hertişt safî bû. Ez bi çar salên karê zorê û piştî van çar salan jî bi çar salên leşgeriyê hatime arihandinê. Îro, sibe em ê biçin. Hêviya min ne şikiyaye, birayê min, min cesareta xwe qet wenda ne kir. Jiyan H her deverê ye. Ne li vê dunya hawurdora me, lê di hundurê me de bi xwe ye. Ez ê dîsa di nav merivan de bim. Ji xwe mana jiyana rastîn jî ev e ku meriv wek merivekî di nav merivan de bimîne, heta û heta wusa bimîne, di çi rewşê de dibe bila bibe lê qels nebe. Ez êdî viya têgêhîştim. Ev ramana ha di xwîn û goştê min de bi cî bû... Ma tew dibe ku ez ji vir û şûn de pêûsê negirime destê xwe? Piştî çar salan, rewşê dîsa dest bide. Ku nivisandin H min were qedexekirin, ez ê bimirim. Panzdeh salan di zîndanê de mayîn û nivisandin, ji min re çêtir e...»

Beriya çûyîna Omskê, Dostoyevskî birayê xwe dibîne. Şopeke nerihetiyê jî li ruyê wî tune. Dilê birayê xwe xweş dike û jê re weha dibêje: «Bêhna xwe teng neke. Ez naçime mirinê. Kesên ku di zîndanê de derkevîna pêşiya min jî meriv in, heywan ninin. Dibe ku merivên ji min baştir û rûmeta wan ji ya min berztir be. Piştî ku ji zîndanê derkevim jî ez ê dîsa dest bi nivisandinê bikim. Di van çend mehên dawîn de ez rastî gelek tiştan hatim û ez ê H wir jî hînê gelek tiştan bibim.»

Di şilê û şepeliya zivistanê de heta mehekê bi taxûkê riya Omskê dikutin. Dema xwe digêhînin zîndana Omskê, ne kar-

mend û ne jî zîndaniyên vir kesek rû nade van girtiyên nû. Di dest de davêjine zîndanê û derî li ser wan tê girtin. Dostoyevskî li ser pêjnên xwe yên wê demê weha dibêje: «Mîna ku ez bi saxî keti bim gornê...»

Zîndaniyên li vir, gundiyên nezan û naşî ne. Dostoyevskî û hevalên xwe jî xwenda, zana û ji malmezinan in. Ev jî dibe sedem ku di navbera wan de nakokî derkeve. Nakokîyeke gun-

dîtî û naşîyane. Li ser vê yekê Dostoyevskî di namyêke xwe de ji birayê xwe re weha dinivîsîne: «Ku dest bide, ew ê me bixwun. Ne gengaz e ku em xwe U hemberî wan biparêzin. Şev û ro em di nav hev de ne û hertim jî ji me re weha dibêjin: Hûn malmezin in. Ma we hindik em dan çokirinê. Hûn jî berê wusa bûn û we neheqî H xelkê dikir. Lê anuha hûn ji me hemûyan jî nizmtir in.»

Sal û demên pêşîn di vê zîndanê de ji bo Dostoyevskî dijwar e. Ji bo ku bi zîndaniyan re danûstandinên xwe dayne, nêzîkî wan be û xwe jî merivekî wekî wan bide naskirinê, çî ji destê wî tê dike. Lê nabe, zîndanî her jê sar in û jê dûr disekinin.

Lê sala dawîn ji bo wî parîkî rihetir derbas dibe. Bi kêmanî îcaza xwendina hinek pirtûkan didine wî. Di sala 1854an de, ji rojan rojeke zivistana navîn Dostoyevskî ji zîndanê tê berdan. Sibê zû U hemû selulên zîndanê digere ku xatir ji hevalên xwe bixwaze. Li ser wê gava derketina xwe jî weha dibêje: «Gelekan destên xwe î hişk û qertûşî dirêjî min kirin. Lê bi rastî jî yên ku destên xwe bi dostanî dirêjî min kirin, gelek kêmbûn. Ji wan gelekan dizanî bûn ku ez ê êdî bibim yekî ji

wan ciyê. Dizanî bûn ku li bajêr nasên min hene û dema ji vir derkevim, ez ê biçim ba wan efendiyan û bi wan re weke wan rûnim. Ev yeka ha dizanî bûn û dema xatir ji min dixwestin, bi tevgereke wusa bûn, mîna ku ez efendiyek bim û ne hevlekî wan.»

Derketina Dostoyevskî hîn jî nayê wê manê ku ew ê bi her awayî serbest bibe û dest bi nivisandin û weşandina berhemên xwe bike. Li Omskê bi qasî du heftan li ba hevlekî xwe dimîne û dûre wî dişînin Semîpalatînskê garnîzona siwarî. Piştî mirina Çar Nîkola L (1855) tîrêjên hêviyên azadiyê U Dostoyevskî xuya dibin û bi xêra nas û dostên xwe yê kar-mend H vir dest bi nivisarên xwe yê edebî dike. Xewna Apo

(1859) û Gundê Stepançîkovo û Şênîyên Wir (1859) dinivisîne, dişîne Rûsiyayê lê çapa van berheman bala kesekî nakêşîne û heta derekê meriv dikane bibêje ku Dostoyevskî ji bîr bûye. Û dîsa U ser notên berhema xwe ya bi navê Bîranînên Ji Mala Mirîyan (1860-62) kar dike.

Û evîna wî ya pêşîn jî H vir dest pê dike. Li vir hevnasiya wî û Mariya Dimîtrîyevna îsayevayê çêdibe. Mariya bîst û şeş sa-Uye û jina alkolîstekî ye. Piştîku mêrê Mariyayê dimire, Dostoyevskî pêşniyara zewacê U wê dike. Lê Mariya pê dide zanîn ku ew evîndarê mamosteyekî ciwan bûye û nikane biryara xwe bide.

Bi alîkariya hevlekî xwe î kevn Dostoyevskî apoleta efseriyê digire, rewşa wî ya aborî xweş dibe û vê pêşniyara xwe ya zewacê ji Mariyayê re dubare dike. Herweha di sala 1857an de bi Mariyayê re dizewuce. Lê bextiyariya ku tê payînê ji

wan dûr e. Mariya bi xwe nikane, bi xwî û ramanên xwe yên naxoş, wî dêşîne, diqahirîne û dilê wî dişikîne. Wekîdin jî nexweşiya jana zirav li Mariyayê diyar e û hêdî hêdî gwînve-mirî dibe û jar dikeve. Di sala 1864an de jî dimire.

Di sala 1858an de daxwaznameyekê ji ciyê pêwîst re bi rê dike ku ji karê leşgeriyê veqete. Di sala 1859an de bersiva vê daxwaznama wî tê ku destûra vegera -wî ya Petersbûrgê tune. Lê dikane biçê Tverê. Dostoyevskî H Tverê jî ji Çar û generalan re daxwaznamên vegera Petersbûrgê dişikîne. Di dawiya dawîn de ev daxwaza wî bi cî tê û di sala 1860î de H Petersbûrgê ye. Bi vegera xwe re tev birayê xwe, bi navê Vremyayê kovarekê diweşînin.

Di ha\ana sala 1862an de Dostoyevskî cara pêşîn derdikeve dûrgeşteke Ewrûpayê. Di Almaniyayê re derbasî Ingilîstanê dibe, li Fransa, Swîsre, îtaHya û Awusturyayê digere. Piştî vê dûrgeşta xwe, U ser dîtîninê xwe yên U ser entelektuelên rûsan serê Dostoyevskî zelal dibe. Li gor tégêhîştina wî, ew ê ji

bo Rûsiyayê mabdrabiyeke mezin be ku meriv bide ser riya nimûna welatên Ewrûpayê. Li ser nivisareke kovarê, Vremya qedexê dibe. Vê carê jî bi navê Epoxayê dest bi weşandina kovareke din dikin. Lê ramanên wî, daxwaz û ramanên rewşenbîrên dema wê rojê, rewşa welêt, qedexebûna kovarê û derxistina vê kovara nû, hemû jî alozî ne. Ji biU van aloziyan, wek ku berê jî hati bû gotin jina wî di vê demê de dimire û piştî du mehan jî birayê wî dimire.

Evîneke nû bi Dostoyevskî ve xuya dibe. Bi navê Appolinarya Suslovayê keçeke ciwan û xwendekar, li Petersbûrgê

şevêkê beşdarî civînekê dibe ku li wir Dostoyevskî çêlî bîranî-  
nên xwe yê zîndanê dike. Li wir xwîna Suslovayê U Dostoy-  
evskî dikele, dUê wê dikeve vî mêtîkê ku bîst salan jê mezintir  
û pêwendiyên wan germ dibe. Lê gelek nabuhure dilsarî U  
Suslovayê peyda dibe. Bi hev re biryara dûrgeşteke Ewrû-  
payê digirin. Lê Dostoyevskî di wê wexta diyarkirî de nikane  
bi Suslovayê re biçê. Dema ku Dostoyevskî tê Parîsê, Suslova  
pê dide zanîn ku ew dildarê yekî Amerîkalatînî bûye. Dostoy-  
evskî gelekî ji Suslovayê hez dike û evîndarê wê bûye. Li ber  
wê digere ku ew ji nû ve pêwendiyên xwe xweş bikin. Lê Sus-  
lova hertim neheqiyê lê dike û wî piçûk dixîne. Û Dostoyev-  
skî hîn jî evîndarê wê ye.

Dostoyevskî dûre vê keçikê bi navê Polînayê di berhema  
xwe ya Qumarbaz (1866) de, bi navê Nastasiya Flîppovnayê  
di îdîot (1869) de û bi navê Grûşenkayê jî di Birayên Karama-  
zov (1879-80) de dide xuyakirinê.

Ji romanên xwe yê mezin Dostoyevskî li ber nivisandina  
Sûc û Cezayh (1866) rûdine û dinivisîne. Di demeke teng û  
dijwar de ye. Ev dijwarî ji tunebûna peran, nerihetbûna ji  
deyndaran e. Ji ber destengiya xwe peymanek bi weşangerekî  
re çêkiriye ku ew ê di wexteke diyarkirî de paknivisa romane-  
ke xwe bide wî. An ne, weşanger ê H ser wan hemû berhemên  
wî yê ku wî heta nuha nivisandiye, rûne. Heta mehekê be-  
riya peymana wan Dostoyevskî rêzîkek jî ne nivisandiye. Dû-  
re bi alîkariya nasekî xwe, ji dibistana stenografîyê bi navê  
Anna Snîtkînayê keçeke jîr û bîstsale banî nivisandinê dikan.  
Piştî bîst û şeş rojan paknivisa romana Qumarbaz amade di-  
be. Di dema karê vê berhemê de bala Dostoyevskî her li ser



vê keçika jîr û şêrîn e. Dûre pêşniyara zewacê U wê dike, ber-siveke erê digire û piştî du mehan jî bi hev re dizewucin. Her-weha Anna Snîtkîna dibe sermiyan û bermaUya Dostoyevskî. Di salên pey re Dostoyevskî gelek peran di lîstikan de wenda dike, rewşa wan xirab dibe, heta tiştên xwe yên dawîn jî bi gi-rûganî datînin; lê dîsa jî ev jinika ciwan, serastiya rêkûpêkiya malê dike, nêzîkî çardeh salan paknivisa gelek berhemên Dostoyevskî ew bi destê xwe dike, dibe histûna mala wî, diya zarokê wî û di ber re jî her li ser nexweşiya wî ya epîlepsiye U wî mêze dike.

Di dawiya jiyana xwe de Dostoyevskî tevayiyê hiş, hêz û wexta xwe dide ser nivisandina berhema xwe ya Birayên Kara-mazov ku tiştêkî weha derkeve. Lê hîn di ser çap û weşandina wê re salek derbas ne bûye, Dostoyevskî dimire (1881).

Çiyayên herî bilind, geliyên herî kwîr, deryayên herî berfe-re, bi kurtî; natûrê bala edebiyata Dostoyevskî ne kişandiye ku di berhemên xwe de nîgara wan bike. Pirsê Dostoyevskî pirsê meriv e. Dixwaze têbigêhîje ka ev aferîda çi ye û dikane têkeve nexşên çendik û çend rewşan. Hîn di hîjdehsaliya xwe de Dostoyevskî ji birayê xwe re weha dinivîsîne: «Meriv, aferî-dekî wusa ye ku têngêhîştin û jihevderxstina wî pir dijwar e. Ku tu tevayiyê jiyana xwe ji bo jihevdeyndstina viya bibuhurînin jî, nekeve wê gumanê ku tu wexta xwe H avarê derbas dikî.

Min ev yeka ha ji xwe re kiriye kar, lewra ez dixwazim bibim meriv.»

Bêguman ev merivê ku tê gotin, merivekî taybetî ye, meri-vekî Dostoyevskî ye, merivek e ku ew dixwaze biafirîne û we-

ke nimûne berde nav civakê, civak li wê nimûna wî binêre, ew jî werine guherandin û herweha civakek nimûnegîn derkeve. Ji xwe ciyêbûna wî ya ji ateîzma Belînskî û sosyalîstên utopîst jî ji ber vê yekê ye. Dema ku bergeha li ber dara mirinê dibîne û dijî, di wê gavê de ruh, mejî û daxwaz ji laşê wî derdikevin û Dostoyevskîyekî pûç li wir, li ber dara mirinê dimîne. Gava ku mizgîna bexîşandinê jî dibihîse, Dostoyevskîyekî nû bi ruyê dunyayê dikeve. Ev guhertina Dostoyevskîyekî kevn û nû, di navbera çend hilman de dibe. Lê ev hilmên ha têra bingehiya felsefa wî dike ku: Ew, dûre bûyer û tîpên çar salên zîndaniya xwe jî li ser bihûne; wekî psîkologekî berî Freud û hemû zanayên vî beşî, xwe di qelişa ruhê rewşa meriv de bera xwarê bide; li wir fêrî wersira rewşa ruhê zarok, jin, xort, dîn, ehmeq, mêrkuj û xwekujan bibe.

Di çar salên xwe yên zîndanê de, Dostoyevskî, bi xwendina încîlê serwextî oldariyeke asimanî û bi nasîna xelkê rûs jî serwextî rastiya civaka wê rojê dibe. Ev oldariya pîrozwer bi humanîzma vw ve dikelc û dixwaze ruhekî paqij, mejiyekî têgêhîştî, xwî û zarekî xweş biafirîne ku jê meriv û civakek bêqisûr ava bike. Li gor wî serketina vê yekê jî tenê bi riya baweriya Xwedê dibe. Û li vir bi van ramanên xwe Dostoyevskî eksîstensiyalîstekî wekî Kierkegaard e.

Beriya ku îdîot were nivisandin, di binê siya van ramanên xwe de Dostoyevskî dbcwaze romaneke dûrûdirêj binivisîne. Ev romana ê ji pênc beşan pêk bihata û ew ê ji 2000 rûpelî jî zêdetir bibûya. Dostoyevskî ê ev romana bi navê Jiyana Gu-nehkarekî Mezin binavanda. Mebesta Dostoyevskî di vir de jî afirandina merivê bêqisûr e. Lê ev romana ku tê gotin, ne hat

nivisandin. Ji dêla ve vê romanê Cinina, Xort (1875) û Birayên Karamazov li ser bingehên vê romana pîrozwer hatine nivisandin.

Dostoyevskî oldarekî mezin e. Bi qasî ku oldar e, bi ewqasî jî dudilî ye. Ji xwe bi vê duduUya xwe serwextî hebûna Xwedê dibe. Di hemû berhemên xwe yê piştî zîndanê de, hebûn û tunebûna Xwedê dihûne, li Xwedê digere. Di ciyekî xirab de bi destê lehengê xwe digirê, pê dilîze, di êş û azara jiyânê de diqepijîne, dixîne dudiliyeke hebûn û tunebûna Xwedê, merivan pê dide kuştin, tirs û gumanê pê dide hîskiriu, dîn dike û bi çolan dbce... Lê di dawiya dawîn de alîkariya lehengê xwe dike, dibe ber deriyê mala Xwedê û U wir wa dide dest Isa. Li ser vê rewşa xwe ya oldariyê, di sala 1870Î de ji Maïkov re weha dinivisîne: «Çi bi zanatî û çi bi nezanî, di tevayiyê jiyana min de, pirsra bingehîn ya ku her di hişê min de, pirsra hebûna Xwedê bû.»

Dostoyevskî yekemîn niviskarê êş û azara jiyânê ye. Hurnermend, psîkolog, humanîst û dilovan... bi van nexşan, yekî nola wî ne hatiya û ne jî çûye. Bi xwe jiyaneke tal, xizan, bi êş û nexweşî buhurandiye. Erd û asiman, cin û perî, çê û xirabî di jiyân û berhemên wî de U hev dipiçikin û hevdu dihûmn. Gelek rexnegir û lêkolîneran H ser Dostoyevskî pir û pir tişt gotine û nivisandine. Ji van tiştan gelekî wan ji hev dûr û gelekî wan jî nêzîkî hev in. Ji ber vê yekê, ez ne bawer im ku bi nîgartineke din û yeke din û yeke din meriv bikani be ruh, raman û felsefa wî bidine famkirinê. Û ne dûrî aqilan e ku em bibêjin: Dostoyevskî bi xwe jî nîgara êş û oldariya xwe, dilo-

vaniya ruhê xwe, kwîraniya felsefa xwe, nexş û hûnandina hûnermendiya xwe bi dev ne kiriye û nikani bûye bike. Dibe ku ev ji bo wî jî gelekî dijwar bûye. Dostoyevskî bi xwendinê tê famkirinê, lê dijwar e ku were katkirinê.

Hesenê Metê

Ax, ev çîroknivîsên ha!... Tiştên kêrdar, baş û dilxwe<sup>^</sup> nanivîsîn; radibin çî tiştên tewş û vala hebin, H hev berhev di-kin û davêjin holê. Ku ji destê min bihata, min ê nivisandin H hemûyan jî qedexe bikira. Çi ne ev tiştên ha! Meriv dixwîne û dixwîne, di ramanan de wenda dibe û pê serê meriv tevlihevî dibe. Wek ku min got, bi navê Xwedê min ê qedexe bikira, rasterast min ê nehiştta ku ew binivîsîn!

Prens V.F. Odoyevskî(\*)

serpêhatiyên

V.F.

Odoyevskî

(1804-1869)«Miriyan

(\*) //

Sax»

8ê Buhara Navîn

Varvara Alekseyevna min ya bêhempa!

Do ez bextiyar bûm, ewqas bextiyar bûm ku tewatî ne di-kete min! Di dawîya dawîn de we dev ji serhişkiya xwe berda, û carekê be jî, we guh H min kir. Şeva çûyî, ez saet H 8an ji xew şiyar bûm. (Xoşewîsta min, mîna ku hûn jî dizanin, piştî

karê vatiniya rojê ez hez dikim ku saetekê duduyan rakevim.)  
Min fmd vexist, kaxez kişand ber xwe û min serê pênuşa xwe  
tûj fikir. Dema ku min serê xwe weha carekê rakir, bû kute-  
kuta dilê min. Mîna ku we di dawiya dawîn de kul û kesera \î  
dilê min î reben fam kiri be. Min nêhirî ku perda pencera we  
hinekî ji hev vebûye û weke wê cara ku min xwesti bû, dîsa bi  
ber guldanika balsamînê(\*) ve bû bû. Di wê gavê de mîna ku  
di pencerê re ruyê we bi ber çavên min bikeve. Ji min wetrê  
hûn jî U min dinêrin û min difikirin. Lê ez ewqasî dilteng bûm  
ku, kevoka min, lewra min nikanî bû ew bergeha serçavê we î  
xweşik ji hev derxista. Lê wextekê, ev çavên me jî bê mij û bê  
ximam bûn, xoşewîsta min. Pîritî birîneke bêderman e, horiya  
min! Çavên min nuha her tarî dibin. Ku ez hinekî bixebitim û  
êvaran binivisînim, sibetirê çavên min sor dibin û hêsir jê tîn.  
Ez şerm dikim ku yek ê min bi vê rewşa girî bibîne.

Lê dîsa jî min anuha di xeyalên xwe de pişirîna we dît, pişirî-  
rîna we ya şêrîn û dilovan. Ew pêjnên ku di wê ramûsana min  
de H min rabû bûn, anuha dîsa dilê min dagirtin. Varenka  
min, wê cara ku min hûn maç kirin, nizanim tê bîra we an ne?  
Lê bi min wusa hat, mîna ku hûn di pencera xwe de gefan li  
min bixwin. Ma ne wusa ye, xaxcirîn! Di nama xwe de, bê  
peyv û bê gotin divê hûn yek bi yek van hemû tiştan binivisî-  
nin.

Balsamîn: //

latînî tê:

Balsamina Hortensis.

Kulîlkeke

(\*)

gîyayîn e. Kulîlkên wê bi gelek rengên têvel in. WW

19

Ka ji vê îcada çîroka perdê re hûn çi dibêjin, Varenka? Pir xweş e, ne wusa? Ez dizanim ku di karkirina xwe de, di rabûn û raketina xwe de hûn her fikra min dikin, min tînine bîra xwe. Kêf û saxiya we li cî ye. Dema hûn perda xwe dadbdnin, hûn pê dibêjin: «Şeva we xweş, Makar Alekseyevîç, wexta razanê hat.» Bi rakirina perdê jî hûn dbcwazin bibêjin: «Rojbaş, Makar Alekseyevîç, hûn baş xewiyan an ne? Hûn çawa nin? Ku hûn pirsê min bikin, şikir ji Xwedê re ez baş im û herweha bextiyar im jî!» Çi riyeke xweş e, ne wusa ye, canekem? Edî tew ne pêwîst e ku em nameyan jî ji hev re bişînin. Ê ev îcada ha jî ji ramanê serê min bû. Ma ji bo tiştên wusa di ser hişê min re raman heye, Varvara Alekseyevna?

Dako, divê ez bi we bidime zanîn ku ez îşev ewqas xweş raketim ku min tew ne dipa. Loma jî kêfa min U cî ye. Hûn dizanin, dema ku meriv koçmalî ciyekê nû dibin, pêşiyê xew nakeve çavên meriv û meriv pê nahewe. Lê ez vê sibê wek cansivikiya teyrekê baz, bi awakî jîndar û kêfxweş şiyar bûm. Xoşewîsta min, û dunya jî ewqas xweş bû ku! Min tavilê pen-

cera

xwe

vekir,

tîrêjên

royê,

vîçevîça

çûçikan,

hêwayek

bêhnxweş... Natur bi her awayî nûbûyîna xwe dide xuyakirin û êdî buhar rengê xwe dide der. Ez noqî ramanên xwe bûm û di kwîraniya ramanê xwe de her ez U dor we çûm û hatim, Varenka... Min hûn şibandin çûçikek asimanî, çûçikek ku ji bo bextiyariya merivan û ji bo xemlûxêza naturê hati be afirandin, hûrik û xweşik. Ax Varenka, ez wê çaxê têgêh<sup>^</sup>tim ku em merivên xemgîn û hustuxwar çiqasî dilbijokên bextiyariya wan ya bêxem û bêguneh in. Ez li ser gelek tiştên weha ketim ramanên kwîr û min gelek nimûnên wusa ji hev dûr, dan ber hev. Di vê pirtûka di destê min de jî gelek pêjnên wusa, bi dûrûdirêjî hatine nîgartin. Xoşewîsta min, ez ev yên ha tenê ji bo tiştêkî dinivînim ku babet babet fantazî hene. Lê anuha êdî buhar e, dako, loma hemû raman jî zelal, hûr û tenik, bi 20

pêjn û xweşik in. Hertîşt bi ronahiyeke soravî nixumiye. Min ev yên ha hemû ji vê pirtûkê wergirtine. Nivîskar di çarînekê de pêjnên dUê xwe weha lêdike û dibêje:

«Çima ez ne çûçikek im, Xwedê, çûçikekî dirênde!» hwd...

Di pirtûkê de wekîdin jî raman hene, lê em nuha dev ji wan berdin. Ez tiştêkî ji we bipirsim, Vavara Alekseyevna, hûn vê sibê zû bi kuderê de diçûn? Ji bo çûyîna kar, beriya ku ez kincên xwe li xwe bikim, wek çûçikek li sibeha buharê hûn ji oda xwe firiyan û çûn. Hûn bi kêfxweşî û dilekî şa di hewşê re derbas bûn. Dema ku min li we nêhirî, pêjnên bextiyariyê H min rabûn. Ax Varenka, Varenka! Xeman nexwun, hêsirên çavan bi kêrî tiştêkî nayên, dayika min... Ez viya ji azmayişên

xwe dizanim, lewra min pir ceriband. Anuha rihetiya we li cî ye û saxiya we jî hinekî baştir bûye. Lê ji Fedorayê çi deng? Ew çi jineke baş e! Varenka, ji min re binivisînin ka hûn bi hev re çawa dijîn, kêfa we li cî ye an ne. Fedora hinekî pilpilok e, lê hûn zêde guhê xwe nedine wê, Varenka. Xwedê bi wê re be! Lê dîsa jî ew jineke dilpak e.

Min berê jî di nama xwe de ji we re çêlî Teresayê kiri bû. Ew jî jineke baş e û bawerî pê dibe. Ez her difikirîm ku em ê çawa namên xwe bigêhînin hev, lê mîna ku Xwedê ji me re Teresa ji asimanan daxist. Jineke cirxweş, gonerm û bêdeng e. Lê çi heyf e ku xwediya xaniyê me dilkevirek e. Wê jinika reben weke kole dixebitîne.

Varvara Alekseyevna, ez ketime kewareke wusa teng ku! Xaniyekî xweş e bi rastî! Hûn dizanin bê ez berê di çi bêdengiyê xweş de dijiyam. Ku kelmêşek di hundurê oda min de bifiriya, dengê pizepiza wê dihate bihîstin. Lê ji dengê qêrîn, tepîn û hewara vir, nayê jiyîn. Hûn bi rewşa \ar nizanin. Korîdoreke dirêj, tarî û gemar bînin ber çavên xwe, li aliyê rastê dîwarekî ripûrût, U hêla çepê jî mîna yên di otêlan de, derîna U pey hev rêz dibin. Li piştî her deriyî odeyek heye û di her

21

odeyekê de du an jî sê kes dimînin. Tişteki bi navê rêkûpêkiyê li vir tune, tu dibê qeyê keştiya Hz. Nûh e! Lê kirêdarên vir baş in, wusa xuyaye merivên xwenda û zana ne. Ji van yek nivismend e, di buroyekê de bi karûbarê edebiyatê ve mijûl dibe. Merivekî zana û dagirtî ye; çêlî Homeros, Brambus(\*) dike, û li ser gelek niviskarên din dipejdve. Dikane di



her warî de bipeyive û merivekî entelektuel e! Li vir du efser jî hcne, hertim bi qeremaçan dilîzin. Û wekî din mamostekî zimanê îgilîzî û deryavanek li vir dimînin... Ca hûn xwe hinekî ragirên, dako! Di nama xwe ya din de, ez ê yek bi yek ji we re çêlî van merivan bikim ku hûn ji xwe re pê bikenin û kêfxweş bibin.

Xwediya xaniyê me jineke bi bejneke kurt û gemarokî ye. Ji sibê heta êvarê bi bertena şevkiras û şimikên lingên xwe digere û her di ser Teresayê de diqîre. Ez li xwarinxanê dimî-

nim,

an jî

ku

ez

rastiya wê

bibêjim,

weha

ye:

Li

tenişt

xwarinxanê odeyek heye, (Xwarinxana me ronik, paqij û xweşik e.) odeyek piçûk û bêdeng e. Ev xwarinxana me ya fere û mezin bi ronahiya sê penceran e. Bi navbirkekê bûye du çavik û herweha aliyekî vir jî bûye wek odeyekê. Bi pencere û ferciyî xwe ciyekî rihet e. Ciyê ku ez lê dimînim jî vir e. Dema ku ez dibêjim ez di xwarinxanê de dimînim, bila tiştêkî din neyête bîra we, dako! Gerçî ez di çavika paş navbirkê de dimînim, lê xem nake. Lewra quncikekî bêdeng û U gor jiyana min ya sade ye. Min ji bo oda xwe karyoleyek, maseyek, kom-

odînek û du sandalî peyda kirine û min wêneyên pîrozweran bi dîwêr ve darde kirine.

Bê guman ciyên ji vir xweşiktir hene, dibe, lê tiştê bingehîn daxwaz û rihetî ye. Min ji bo xwe vir çêtir diye û loma U vir (\*)Brambeus: Nasnavê Senkovskî (m. 1858) ye. Di demaxwe de bi niviskariya romanên xwe navûdeng daye. Lê ev navûdengê wîji bêkêriya wî hatiye. WW

22

dimînim. Bawer nekin ku ev ji bo tiştêkî din e. Pencera we li hemberî min e, di navbera me de hewşek teng tenê heye, di çûn û hatina we de dikanim li we binêrim û dilê rebenekî no-la min jî tenê bi vî awayî şa dibe. Li vir tew ez peran jî didim ser hev. Oda herî erzan tev xwarina mehê 35 rûbil in û ev jî aboriya min dest nade! Lê ez 7 rûbilan didim kirêya vî ciyê xwe û ji bo tiştên din jî 17,5 û herweha bi tevayî dike 24,5 rûbil. Berê min 30 rûbil dida, lê dîsa jî ji gelek tiştan bêpar dimam. Serqisê min çay venedbcwar. Lê anuha aboriya min têra çayê jî û têra şeker jî dike. Carina ez ji ber vê venexwarina çayê şerm dikim, dako, nizanim hûn dizanin an ne. Li vir rewşa herkesî xweş e. Vexwarina çayê jî li serê merivan dikine mêraniyeke mezin, Varenka. Lê ji bo min tew jî girîngiya van tiştan tune. Ca hûn bi xwe bifikirin, ma ku ez xwe bidim ber kirîna potîn, kinc û pêwîstiyên din, perê min ji ber dimîne? Herweha tevayiyê mehana min diçe. Lê dîsa jî mehana min bi dilê min e. Têra min dike û ev çend sal in ku herweha derbas dibe. Di ser de jî weke xelat perenê zêde jî dikeve destê min. De bi xatirê we, horiya min! Min ji we re tevî guldanikan

du kulîlik kirîne; yek balsamîn e û yek jî geranium(\*) e, min  
pir erzan jî kirîn. Nizanim hûn ji kulîlka resedayê(\*\*) jî hez  
dikin an ne? Ew jî heye, di nama xwe de ji min re binivisînin.  
Heta ku ji destê we tê, dûrûdirêj, hertiştî bi ser û ber ve ji min  
re binivisînin. Wekî din jî, ji bo ku min odeyek weha kirc ki-  
riye bêhna xwe teng nekin û di ser min de hustuxwar nebin,  
dako. Ez bi rihetiya odê pir kêfxweş im, ji xwe tiştê ku min  
dilkelîn dike jî ev e. Ez peran jî berhev dikim, ji xwe ji nuha  
de çend quruşê min yên berhevkirî hene. Li ber çavê we, tir-  
(\*) Geranium: Ji latîne tê: Geranium Odoratissium. Kidîlkeke  
bi bergên bêhnxe e û kulîlkên wê bi rengên têvel in. WW  
(\*\*) Reseda: // latîne: Reseda Odorata: Kulkeke bêhnxe e  
û bi rengê kesk û sipîçolkîye. WW

23

sonekekî wusa xuya dikim ku ji we wetrê ez ê H ber bayê mê-  
şekê bikevime erdê. Lê ne wusa ye, dako, ez ne merivekî  
ehmeq im. Ez xwediyê karakterekî merivên giran im. Di xwe-  
şiyê de bimînin, horiya min ya xweşik! Min du rûpel nivis da-  
girtiye. Anuha diviya bû ez ji zû ve U ser kar bûyama. Ez wan  
tiliyên we yên hûrik radimûsim.

Xulamê we îgiramgîr, dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

NOT: Horiya min ya piçûk, ez dixwazim hûn ji min re heta  
ku ji dest we tê dûrûdirêj binivisînin. Va ye ez bi vê nama xwe  
re ji we re fûntek(\*) şêrînî jî bi rê dikim. Li we noşcan be! Lê  
hûn bi Xwedê dikin, tew ji bo min xeman nexwun û hus-  
tuxwar nebin! Di xweşiyê de bimînin, dako!

8ê Buhara Navîn

Mîrza Makar Alekseyevîçê giranbuha!

Ma hûn dizanin, ez wer bawer im ku em ê di dawiya dawîn de ji hev bixeyidin! Bi sondxwarin dibêjim ku dema ez xelaten we distînim, bi rastîjî ez pê dêşim, Makar Alekseyevîç. Ji bo kirîna van tiştan ez dizanim bê anuha hûn xwe ji çi pêwîstiyên xwe yên girîng bêpar dikin. Gelek caran min ji we re gotiye ku pêwîstiya min ji tişteki tune, tew ji tişteki tune, rewşa min jî dest nade ku ez wan çeyiyên we yên heta nuha bi cî bînim. Çima we ev guldankên ha şandine? Balsamîn dîsa em bibêjin erê, lê ev geraniuma çi ye? Di warê vê geraniumê de ku bê daxwaza min jî peyvek ji devê min derkeve, hûn ê tavilê (\*) Fûnt: Di rûsiya kevn de navê pîvaneke giraniyê ye. 409,5 gramên îroyîn e. WW

24

biçin û bikin. Wusa xuyaye gelekî jî buha bû. Kulîlkên gelekî xweşik in, tew bi deqikên sorekî tarî ne jî. We ev geraniuma wusa xweşik ji kuderê peyda kir? Min ew di pencerê de, U ciyekî ku baştir xuya dike, danî. Lê ku pere bi dest min bikeve, ez ê textekî guldanikan bikirim, U rasta odê daynim û hemû kulîlkên din jî H ser bi cî bikim. Bes ku bila pere bi dest min bikeve. Fedora ji kêfxweşiyê dike bifire. Hundurê oda me bûye wek buhuştê, ronî û paqij e. Baş e, we çima şêrînî şandiye? Ez ji nama we tégêhîştim ku hişê we ne li serê we ye. Buhuşt, buhar, bêhnên xweş H hawirdor didine der, vîçe-vîça çûçikan... Di dilê xwe de min got helbest ê jî hebe. Lê bi rastî jî tenê helbest ji nama we kêm bû, Makar Alekseyevîç. Ji

pêjnên tenik heta xeyalên soravî hertişt tê de hebû. Ku em werin ser çîroka perdê jî, ya rastî min tew bîra xwe û vê yekê ne kiri bû. Dibe ku di rastkirina guldankan de, ew xwe bi xwe pê ve aUqî be. Û weha bûye.

Ax, Makar, Alekseyevîç! Hûn çiqasî dibêjin bibêjin, an jî bidine xuyakirin ku butça we, hatina we H mesrefa we diçe, hûn dîsa jî nikanin rastiyê ji min veşêrin. Xweş diyar e ku hûn ji bo min, xwe ji hewceyiyên xwe yên pêwîst dikin. Serqisê, ji kuderê hat hişê we ku hûn xaniyekî wusa sade kirê bikin? We xwe kurisandiyê ciyekî teng. Serê we tevlihev û hûn nerihet in. Hûn bi xwe ji tenêtî û bêdengiyê hez dikin, lê li wir ji bilî deng û qîrewîrê tişteke tune. Bi wê mehana xwe, hûn dikanin di ciyekî baştir de bimînin. Fedora dibêje hûn berê di ciyekî gelekî baştir de dijiyan. Ma rastî jî tevayiyê jiyana we wusa bi tenêtî û di tunebûnê de, bêyî ku dengê dostekî bibîhisî û pê dilê we xweş bibe, her di nava biyaniyan de H quncikekî derbas bû? Ax, dostê hêja, gelekî gunehê min bi we tê! De qet nebe H saxiya giyanê xwe binêrin, Makar Alekseyevîç! Hûn dibêjin ku êdî çavên we jî weke berê nabînin ku hûn U ber ro-nahiyê binivîsînin. Wê çaxê nenivîsînin. Ji xwe amîrên we pê

25

dizanin ku hûn li hemberî vatiniya xwe çiqasî rast in.

Ez careke din jî ji we lava dikim, ji bo min ewqas zêde per-rê xwe xerc nekin. Ez dizanim hûn ji min hez dikin, lê hûn bi xwe ne dewlemend in... îro ez jî bi kêf ji xew rabûm, cansivikiya şayî û kêfxweşiyekê H ser min bû. Fedorayê ji xwe re jî û ji min re jî kar peyda kiri bû. Li ser vê kêfxweşiyê, ez rabûm

çûm min hevrişîm kirî û ez hatim min dest bi karê xwe kir.  
Heta nîvro dilê min şa û rihet bû, kêfa min bû bû kêfa gur! Lê  
anuha dîsa xemgîniyekê girtiye ser min û ez bi ramanên xwe  
yên reş û tarî her difikirim. Ax, ez ê çi bim û dawiya min ê çi  
be? Jiyaneke wusa bêbiryar, bimij û nediyar, bêyî ku bizani  
be ka pêjerojên meriv ê bi çi awayî bibe, çiqas xirab e! Wexta  
ku ez li demên xwe yên buhurî vedigerim, ricifiyên tirsê bi la-  
şê min dikevin. Ez demên ewqas tal ii teng jiyam ku bîranîna  
wan jî dilê min diperitîne. Ez ê heta dawiya jiyana xwe jî li  
wan merivên bêbext nifiran bikim, merivên ku jiyana li min he-  
rimandin.

Ro li ber ava ye. Anuha dîsa divê ez dest bavêjime kar.  
Gelek tiştên ku ez bbcwazim ji we re binivisînim hene, lê wex-  
ta min tune. Lewra ev karê di dest min de, heta demeke diy-  
arkirî divê biqede. Namenivisîn tişteki pir xweş e û bi vî awayî  
meriv dikane xemgîniya xwe belav bike. Lê ca bibêjin, Makar  
Alekseyevîç, çima hûn bi xwe carekê ber bi me nayên? Ji xwe  
hûn êdî nêzîkî me ne û wexta we ya vala jî heye. Kerem bikin,  
carina werin mala me! Min Teresa we dît. Bawer im pir nex-  
weş e. Dilê min pê şewutî, min rabû 20 kopêk da wê. Hindik  
ma bû min ji bîr bikira: Di warê jiyana xwe de ji min re dûrû-  
dirêj binivisînin. Li derûdora we merivên çawa hene? Hûn ji  
wan xweş in, an ne? Min gelek divê ku ez bi hemû tiştan biza-  
ni bim ka çawa ye. Dereng nerinin! Îro bi taybetî ez ê kujê  
perdê rakim. Biçin û hinekî zûtir rakevin. Do heta nîvê şevê jî  
min ronahiya oda we pêketî dît. Di xweşiyê de bimînin. Roja

Îroyîn U min xemgîn û bêhtengîn e. Bê gmnan rojên weha jî di ser merivan de tîn. Bi xatirê we!

Varvara Dobroselova we.

8ê Buhara Navîn

Varvara Alekseyevna delal!

Belê dayika min, roniya herdu çavên min, ma vî çavê serê min î reben ê ev roja reş jî bidîta! Belê, Varvara Alekseyevna, we baş tinazên xwe bi min, bi vî pîremêrî kiriye. Gerçî çewtî, ya min e, ya min û ne ya kesekî din! Di vî salê xwe de, bi van çend tayê porê ku bi serê min ve mane, diviya bû ez neketa-ma danûsitandinên dildariyên bêbinî... Va ye ez dîsa dibêjim, dako: Meriv carina tê guhertin, wusa tê guhertin ku liîşê merivan disekine. Her peyvên wusa ji devê meriv derdikeve ku Xwedêyo! Lê dawiya wê! Çi jê dertê? Ji tiştêkî vikûvala barek çewtî derdikeve holê. Xwedê min ji wan tiştan bisitirîne! Na dako, ez ji we ne êşiyame, lê bîranîna van tiştan bêhtengiyê li min peyda dike. Ez gelek xemgîn im ku min ji we re tiştên bi mebestên veşartî nivisîn.

Îro ez bi serekî wusa buind, pêjnên wusa tenik çûm buroyê ku dilê min şa û sivik bû. Hênikayîyeke wusa girti bû ser dilê min ku ji kêfxweşiyê bask li min radibû, nizanim çima. Min ji dilûcan destê xwe havête karê li ser masa nivisînê, lê dûre çî bû. Dema ku min li dora xwe nêhirî, nola berê hertişt reş û tarî bû. Dîsa ew çilkên huburê, ew masa ku deste bi deste gurozên kaxezên tevkirî li ser û ez jî dîsa wek xwe î berê bûm. Baş e, min çima helbest xwendi bû? Ev çima weha bû bû? Ji ber ku ro bi tîrêj û asiman çîksayî bû! Ma ne ji ber vê yekê bû? Xwedê dizane di dilên me de, di binê pencerên me de

her tiştên wusa hebûn ku, lê min rabûye çêlê geraniuman kiriyê. Ev hemû tiştên ha, ji sedî sed di pêleke ehmeqiya min de girtine ser min. Lê carina meriv ji bo pêjnên xwe jî pesta dibêje û peyvên çewt dike. Sedema vê yekê jî, ew kewkeliya hare ku di dilê meriv de hildavêje.

Bi awayê hertimî ez ne hatim malê. Bi gotineke rastirîn, bi dijwarî min xwe gîhande odê. Ji ber sedemekê, serêşekê bi min girti bii. Ez bawer im min serma li xwe xisti bû, lê hertişt girêdayiyê hev e. Bi hatina buharê, weke ehmeqan kêfa min hati bû û ez bi bertena paltoyekî tenik derketi bûm. Û we jî rabû ev pêjnên min çewt fam kir, berxika min. Hûn bi germiya van pêjnên dilê min xapiyan û hûn çewt di min gêhîştin. Tiştê ku zor da min û ez wan peyvikan binivisînim, hezkirina baviyekê bû, Varvara Alekseyevna, hezkirineke pikûpak! Ji ber sêwîbûna we, bi rastî jî ciyê min î U ba we, ciyê bavekî ye. Ez viya ji pakiya dilê xwe û bi daxwaza ruhê xwe î mervatiya me, wek ku metelok dibêje, ji pisê pisê pismaman tê, lê dîsa jî em merivên hev in. Di roja îroyîn de ez nêzîktirîn nas û paşmêrê we me. Loma we jî maf hebû ku we ji \î nasê xwe parastin bipa. Lê ji bilî piçûkxistin û xapandinê we tiştê ne dît. îcar ku em vegerin ser helbestê, dayika min, bi pîremêrekî nola min nakeve ku ez bi tiştên weha de bikevim. MijilUya bi karekî weha, ehmeqî ye. Di roja îroyîn de zarokên dibistanan jî dema ku helbestan dinivisînin, têne sîlekirin... Helbestvanî tiştêkî weha ye, berxika min.

Ew rihetî û luksa ku hûn di nama xwe de ji min re dinimî-



nin çî ye, Varvara Alekseyevna? Ez ne merivekî qure û ne jî bûme xwediyê daxwazên zêde, dako. Ew jiyana ku heta nuha ez tê de jiyam, ji jiyana min ya îro ne çêtir bû. Piştî vî salê xwe, çima ez ê rabim bibime pilpîlok? Zikê min têr, kincên germ li min û ez ne pêxwasî me. Ma ez ê ji bo çî pilepilê bikim? Ez ne ji mala Konta me jî! Bavê min ne ji malmezinan

28

bii û U gel ku naxirek kulfet dor lê girti bû, bi qasî van perên ku ez distînim, ne dikete destê wî. Ez yekî nazdar jî ninim! Lê xaniyê min î berê bi rastî jî gelek û gelek çêtir bû, dako, bi her awayî rihetir bû. Ev oda min ya nuha jî ne xirab e. Bi taybetî ji hinek hêlên xwe ve xweşîktir û bi awayekî din e û ez viya ji dil dibêjim. Lê dîsa jî ew oda min ya berê ji bîra min naçe. Em pîremêr, ango xwiyê merivên pîr e ku her girêdayiyê tiştên xwe yê kevn bimînin. Ew oda kevn piçûk bû. Dîwarên wê (Nizanim çima ez çêlî van tiştan dikim!) weke hemû dîwaran, diwarên wê jî dîwar bûn. Lê pîrsgirêk ne dîwar in, tiştê ku min xemgîn dbdne, bîranîn in. Her bîranîneke demên buhurî, kêfa min direvîne. Tiştêkî seyr e! Li gel giranî û xemgîniya xwe ev bîranînen ha dîsa jî xweş in. Dema ew bêhtengî û nebaşiyên wê demê dibine bîranîn, aliyên xwe yê xirab wenda dîkin û tew bi merivan şêrîn jî dibin. Ez û xwedîya xaniyê xwe, em ewqas bêdeng bi hev re jiyana ku, Varenka! Pîrejina reben mir. Bi bîranîna wê agir bi kezeba min dikeve. Jineke pîr dilovan bû û zêde kirê ji min ne digirt. Hertim du singên dirêj di dest de bû, ter^ên ku ji ber paçikên kevn dibirî, ji wan rûbend çêdikir. Hemû karê wê ev bû. Ji ber ku me bi hev re fin-

dek tenê bi kar dihanî, me herduyan jî li ser maseyekê kar dikir. Neviyeke wê ya bi navê Maşa hebû. Piçûktiya wê di bîra min de ye. Anuha li dor sêzdehsaliya xwe ye. Keçikek no û şa hû, hertim qeşmerî dikir û em dikenandin... Em hersê bi hev re wusa dijiyan. Di şevdirêjên zivistanê de em li dor masa xwe ya gulover rûdiniştin, me berê çaya xwe vedbcwar û dûre jî em her yek û karê xwe. Ji bo ku bêhna Maşayê teng nebe û nerindiyê neke, pîrejînê dest bi xevroşkan dikir û jê re kat dikir. Çi xevroşk bûn! Ne tenê zarokan, merivên mezin ê jî ji dil guhdariya wan bikira! Dema ku min qeliina xwe vêdudst û wusa ji dil guhdariya wan çîrokan dikir, êdî karê min jî ne diket bîra min. Lê tew piçûka me ya nerind! Wê jî destê xwe î

29

hûrik disiparte binê argûşa xwe ya sorikî û wusa deyjihe\ a û bi raman guhdarî dikir. Ku xevroşk hinekî jî bi tirs bûya, çavên xwe digirt û xwe bi pîrika xwe ve dişidand. Di demên weha de temaşekirina li wê, pir û pir xweş bû. Me tew hay jê ne dibû ku ronahiya findê çawa diqediya, û dengê pûk û bagêra derve ne dihat guhên me. Belê Varenka, bi qasî bîst salan me bi hev re jiyaneke weha xweş buhurand.

De ez jî çima van tiştan dinivisînim? Dibe ku kêfa we ji mijarên weha re nayê. Ji xwe yê min jî wusa ye. Tew dema ku tariya şevê weha dadikeve ruyê erdê, bîranîna van tiştan dilê min jî teng dike. Teresa mijûlî tişteki dibe, serêşekê bi min girtî û piştî min jî dêşe. Ramanên di serê min de tevlihev in û mîna ku êşekê dide mejiyê min... îro bêhna min teng e, Varenka! Lê ew çî ye we ji min re nivisiye, berxika min? Ma ez ê

çawa werim mala we, canekem, dûre xelk ê çi bibêjin? Di hewşa xênî de derûcîran ê bibînin û ew ê dûre navnotî bi pey me bikeve. Lewra ew ê bi çavekî din binêrin. Na, horiya min, ez ê sibe êvarê we li dêrê bibînim. Ev ji bo me herduyan jî tevegereke baştir û baqilanetir e. Li min biborin ku min nameyeke weha ji we re nivisiye: Dema min ji nû ve xwend, têgêhîştîm ku ne tiştêkî di cî de ye. Ez pîremêrekî nezan im, Varenka. Di xortaniya min de rewşa min dest ne da ku ez bixwînim. Ê piştî vî salê xwe jî rabim bbcwînim, tiştêk ê nekeve serê min. Ez ji we re vekirî bibêjim, kevoka min, di min de hunera katkirinê tune ye. Ez dizanim ku dema ez bbcwazim tiştêkî vekirî binivisînim, ez ê tevlihev bikim. Ji bo ku ez vê rewşê bizani bim, pêwastiya min ji tinaz û berpoziyên kesekîjî tune ye. Min îro hûn li ber pencerê dîtin, dema ku we perda xwe dadbdst. Bibore, li min bibore! Xwedê bi we re be! Bi xatirê we, Varvara Alekseyevna!

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

30

NOT: Kevoka min, ji vir û weha ez ê ji kesekî re nivisarên hicivane nenivisînim. Lewra bi qasî ku li avarê bipeyivim, ez pîr bûme êdî. Mîna ku metelok dibêje; yên ku ji bo hinekan çalê bikole, ew ê bi xwe têkeviyê, dûre xelk ê bi min bikenin.

9ê Buhara Navîn

Berêz Makar Alekseyevîç!

Dostê min î hêja, Makar Alekseyevîç, çima hûn di serê xwe de tiştan li hev tînin û pê xwe dêşînin, ma ne şerm e? Na

xwe hûn ji min şikiyan? Of of, rast e, carina tevgerên min yên bêpîvan çêdibin, lê min nizanî bû ku hûn ê li dilê xwe bigirên. Bawer bikin ez ne diwêrim bi salên we û ne jî karakterê we tinazên xwe bikim. Ev hemû jî ji bêhtengî û bêramaniya min bûye. Ji bêhtengiya xwe meriv dikane hertiştî bike. Ji min weatrê we jî xwestiya hûn di nama xwe de hinekî henekan bikin. Lê piştî ku ez têgêhîştim hûn ji min êşiyane, ez pir xemgîn bûm. Na, hevalê min î hêja û giranbuha, ku we şika dilhişkî û nankoriya min hebe, hûn gelekî çewt difikirin. Ez jidil sipasdarê wê çêyiya we me ku we ez ji nebaşî û hêrişên wan merivên xirab parastim. Heta dawiya jiyana xwe jî ez ê hertim ji bo we banî Xwedê bikim. Ku ev daxwazên min li asimanên jorîn bête hewandin û bigêhîje Xwedê, hûn ê bextiyar bibin.

Îro ez gelekî kêfrevî me. Tayê bi min girtiye, carina dikim ji germê bifetisim ii carina jî diqefilim. Fedora di ser min de hustuxwar e. Ji halina mala me, ne pêwîst e ku hûn şerm bikin, Makar Alekseyevîç. Ma ji kê re çî? Em nasên hev in û hew! Ez nama xwe li vir diqedînim. Zêdetir jî tiştê ku ez bini-visînim tuneye. Ji xwe hêle jî di min de ne ma, gelekî nerihet

31

im. Bi xatirê we, Makar Alekseyevîç.

Ez car bi car ji we lava dikim ku hûn ê ji min neşikên, û bêşik ji min bawer bikin ku ez hertim bi giramgîrî bi we re me. Destirmana we ya nefspiçûk û bi dUsozî bi we re...

Varvara Dobroselova

12ê Buhara Navîn

Varvara Alekseyevna giranbuha!

Ax dako, dîsa çi bû bi we? Hûn hertim weha min ditirsîn.

Di her nama xwe de ez dinivisînim û dibêim: Kincên germ li xwe bikin û di rojên sar û şîHyê de dernekevin der û xwe hemet bikin. Lê ez dinêrim ku hûn tew guhê xwe nadine min. Bi rastî jî hûn wek zarokekê ne, horiya min. Ez dizanûn hûn jar in û wek qirşekî kayê hûn narîn in. Ku pêlên bayî piçekî jî bileqe, hûn ê tavi lê nexweş bikevin. Wê çaxê divê hûn li xwe binêrin, ji her babetên xeteriyê xwe biparêzên û dostên xwe hustuxwar nehêUn.

Hûn ji min daxwaz dikin ku ez jiyana xwe, derûdora xwe ji ser û ber ve kat bikim, dako. Ez ê vê daxwaza we ji dil bi cî bînim. Ez ê ji serî de dest pê bikim, hevala min, wusa baştir dibe.

Beriya hertiştî bergeha ji hêla kuçê bi her awayî xweş e, nemaze pêlika li pêş malê paqij, ronî û fere ye, bi xwe ji darê sor e û destikê wê tûncîn e. Lê pêlika paş malê, ne hûn bipirsîn û ne jî ez bibêjim. Xilûxwarî, bi nedaw û pêlkokên wê şikiyayî ne. Dîwar ewqas qirêj û bi rûn e ku destê merivan pê ve dizeliqe. Li ser her xirpenga pêlikan sandoq, sandalî û dolapên kevn ii şikiyayî H ser hev in. Bi vir û wir de paç û gir^i-na

dardekirî ne,

camên

penceran şikestî ne.

Ferûfolên ji

32

tozûtewar, qaşikên hêkan û hundurê masiyan tijî ne û her de-  
ver bi bêhneke genî ye. Bi kurtî ne xweş e.

Di warê odeyan de ji xwe min berîjî nivisîbû. Ciyên fere û  
xweş in, gazin jê nabe, lê bêhna merivan diçikîne. Ya rastî hê-  
wayek

fetisok

û

mîna

ku

li

quncikekî tişteki heUsî hebe,

bêhneke kufikî tê. Di gava pêşîn de tişteki pir xirab e. Lê xem  
nake, piştî du sê deqan meriv hînî wê bêhnê dibe. Lewra ew  
bêhna êdî H dest û kincên meriv, U her deverên meriv jî datê.  
Lê kanariya nikanin weke me xwe li ber vê bêhnê bigirên. Ev  
bû kanariya pêncan ku deryevan dikire, lê hêwa me li van çû-  
çikan nayê û yek bi yek dimirin. Aşxana me mezin, fere û ronî  
ye. Gerçî sibehan dema ku masî an jî goşteki tê sorkirin, tije  
dûkel dibe, av dipijiqê derûdorê... lê dîsa jî bi serê êvarê re  
aşxana me dibe weke buhuşteke rastkîno. Li aşxana me çî şil  
çî zuwa hertim kincina bi ben ve dardekirî ne. Ji ber ku oda  
min jî bi vê aşxanê ve ye, ji bêhna kincan nerihetî U min çêdi-  
be. Lê xem nake, meriv xwe hînî wê jî dike.

Li mala me, bi hilatina royê re teqereq dest pê dike, Va-  
renka. Radibin digerin, bi vir û wir de dibezin û li derina di-  
kevin. Herkes bi karekî dadikeve, hinekên ji van ji bo çûyîna  
ser karê xwe rabûne ii hinek jî ji xwe re zû radibin. Lê ji bo

hemûyan jî karê pêşîn, vexwarina çayê ye. Piraniya semaweran, yên xwediya xênî ye. Ji ber ku hindik in, em wan bi dobê bi kar tînin. Ku yek doba xwe têxe pêşiya doba yekî din, maUk li wî xirab dibe. Dema ku ez nû hati bûm, ev mabdrabiya di serê min de jî hati bû. Lê dev jê berdin, katkirina min bi kêrî tiştêkî nayê... Ji xwe bi vî awaji ez bi hemûyan ve bûm nas û dost. Berî hemûyan dostaniya min bi deryavan ve çêbû. Merivêkî şorgerm e. Çêlî hertiştî kir û hemû tiştên xwe ji min re got. Qala dê û bavê xwe kir, çêU xwenga xwe kir ku H Tulayê bi dadpirsekî re zewuciye, û çêU bajarê Kronstadê kir. Soz da min ku bi her awajî alîkariya min bike, ji min re bibe sitare û

33

dûre ez banî oda xwe kirim ku çayê vexum. Ez carekê çûm oda wî, di ser xumarê de biin. Çayek dan min û xwestin ku ez jî beşdarî vê lîstika wan bibim. Êdî ez nizanim bê henek dikirin an bi rastî digotin. Lê xweş xuya bû ku ji êvarê de diUstin û dema ku ez ketim hundur jî lîstikê dom dikir. Perçên tebeşîran, kaxezên qeremaçan û dûkeleke... çavên merivan dişewutand. Dema têgêhîştin ku ez xwe nadim ber lîstikê, ji wan wetrê ez feylesofiyê dikim, ii êdî bi min re ne peyivîn. Ya rastî jî ez ji vê yekê pir kêfxweş bûm. Êdî ez lingên xwe navêjime wir, hemû jî xumarbazên har in! Li ba karmendê lîteraturîst jî carina şevcivîn çêdibin, lê ew şevbuhurkên wir xweş, paqij ii kêrdar in.

Beriya ku ez derbas bim, divê ez ji we re çêlî xwediya xaniyê me jî bikim, Varenka. Jineke bêcir e, rasterast cadûkarek e. We bi xwe jî dît ku Teresa di çi rewşê de ye, ne wusa?

Jar li sinix ketiye, bûye weke mirîşkek rûçikî. Ji xwe di xanî de me du destirman hene: Jê yek Teresa ye û yê din jî Faldonî ye. Ez nizanim ka wî navekî din jî heye an ne, lê herkes bi vî navî banî wî dikin. Yekî porsor, (Fînî ye çi ye!) pozpelbd û ji çavekî xwe kwîr e, wek heywanekî beradayî ye. Hertim li ber pozê Teresayê ye, pir namîne ku bi hev re pevçinin. Bi kurtî li vir jiyana min ne bi dilê min e. Ne gengaz e ku meriv şevê bibîne hemû biçin bikevine xewa xwe û bêdengî bibe. Hertim meriv dibîne ku li deverêkê rûniştine û qeremaçan dilîzin, li carina jî hertiştên wusa dikin, şerm e ku meriv çêlî wan bike. Çiqas nebe jî ez hinekî hîn bûme, lê ez têngêjim ku malbatên bi zarok çawa debarî vê hingemê dikin. Li vir, di xaniyê me de malbateke xizan dimîne. Oda ku wan kirê kiriye, ne di rêza odên din de ye, U serê quncikê hêla hember odeyek bi tikûtenê ye. Merivên bêdeng in, kes têkilî wan nabin. Oda xwe bi navbirkekê kirine du beş û ji xwe re tê de dimînin. Mêrê malê karmendekê betal e. Ez nizanim ji ber çi ye, lê heft sal

34

berê ew ji kar havêtine. Navê wî Gorşkov e. Merivekî kinikî û tayê sipî ketine porê wî. Kincên vn ewqas gemarî, ewqas peritolî ne ku dilê merivan pê dişevmte. Ji yên min jî xirabtir in! Em di korîdorê de carina rastî hev tînin. Rebenekî peşmûrde ye. Dest û ling lê dilerize û serê wî diheze. Xwedê dizane nexweşiyê wî heye. Gelekî fedîyok e, ji herkesî ditirse, xwe dide hev û ji merivan dûr diçe. Ez jî carina xwe ji merivan vedikêşim, lê ewqas jî ne. Jin û sê zarokên wî hene. Kurê wî yê mezin wek bavê xwe rebenekî jihevketî ye. Ji hinek hêlên xwe



xuyaye ku jina wî di wexta xwe de xweşik bûye. Lê anuha rebenê di rewşeke vrasa peşmûrde de ye ku! Li gor ku min bihîst, ew deyndarê xwediya xaniyê me ne, loma cadûkar H hemberî wan her bi poz û awur e. Li ser hinek nerindiyên Gorşkov jî tiştina hatin guhê min, û dibêjin sedemên havêtina wî ya ji kar jî ji ber wan tiştan e. Ya rastî ez nizanim ka dozeka an karê dadgeh ii dadpisiyekê di serê wî de hatiye. Lê ev malbata ha gelek û gelek xizan e. Oda wan hertim bêdeng e, Xwedêyo, mîna ku kesek tê de tune be. Zarokên wan jî har nabin. Tu carî meriv nabîne ku zarokên wan weke hemû zarokên din bi hev re dilîzin an bi hev dikenin. Lê ev tiştêkî xirab e. Şevêkê ez di ber deriyê wan re derbas dibûm, di wê gavê de dîsa bêdengiyê girti bû ser malê. Ji nişka ve dengê hîskînekê hate guhê min, dûre pistepist ii dîsa min dengê hîskînê bihîst, mîna ku yek digirîya. Lê ev girî ewqas jidil û ewqas bêdeng bû ku agir bi kezeba min xist. Wê şevê her ez U ser van rebenan ketim ramanan û weke şevên herşevîn xew U min herimî.

Varenka, de anuha bi xatirê we, bendka min! Heta ku ji min hat, min hertişt ji we re kat kir. îro ez li ser we fikirîme. Ji bo we agir bi kezeba min dikeve, dako. Ez baş dizanim ku we paltoyekê germ nîne. Ez bi bagêr û şilopa buharên vê Petersburgê dizanim, ji bo merivan mirin e, Varenka! Xwedê  
35

merivan ji van tofanan bisitirîne! Nama min xweş ne bûye, Varenka, li min biborin. Çi bikim, ez nikanim baştir bidim famkirinê. Ji bo ku hûn piçekê bextiyar bibin, çi tê ber devê

min ez dinivisînim. Ku min di wexta xwe de xwendi bûya, wê çaxê rewş dibii tiştêkî din. Lê ne min xwendin dît û ne jî ez hînî tiştêkî bûm!

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

25ê Buhara Navîn

Makar Alekseyevîçê giranbuha!

Îro ez rastî dotmama xwe şaşayê hatim. Di rewşeke xirab de ye, rebenê. Ew ê tetirxanî bibe. Li gor ku min bihîstiyê, Anna Fedorovna her li pey min digere. Wusa xuyaye ev jinika dest ji hustukura min bernade. Gotiyê ku ew ê min bibexşîne, ew ê tiştên derbasbûyî ji bîr bike û xwestiyê ku were min bibîne. Li gor tiştên ku wê gotine, merivatiya min ii wê nêzîktir e û mafê we tuneye ku hiin xwe têkilî malabata me bikin. Ji bo min jî gotiyê ev şerm û rîreşiyêke mezin e ku ez bi perê destê we xwedî dibim, min mêvanperweriya wê ji bîr kiriye ku wê du sal û nîvan xwedîtiya min û diya min kiriye, em ji birçîbiinê filitandine, deynê me H me bexîşandiyê...

Dev ji diya min jî bernade! Diya min ya reben, ku bizanî

bîiya ev jinika çî tîne serê min! Lê Xwedê bi hertiştî dizane.

Anna Fedorovnayê wekîdin jî gotiyê ku wê ez dame ser riya

bextiyariyê, lê min ji kêmaqiliya xwe ev riya wenda kiriye.

Min şerefmendiya xwe ne parastiyê, dibe ku min ne xwestiyê...

Xwedêyo, baş e, lê gunehkarê vê yekê kî ye? Gotiyê,

Mîrza Bukov baş kiriye ku bi yeke weke min re ne zewuciyê.

36

yeke ku... uff, têngêhîjim çima ez van tiştana dinivisînim.

Dema ku ez van derewên weha dibihîsim, ez pê dêşim, Mark Alekseyevîç. Ez nizanim ku anuha çi bi min hatiye, lê diricifim, dihîskim û digirîm. Ev nameya ha jî, min du saetên xwe daye ku ez binivînim. Ji min wetrê ew jinika ê li xwe mikûr were bê çi neheqî li min kiriye, lê tew di ser de çi gotinan jî dibêje!

Ji bona Xwedê tew ji bo min neqirqilin, hevalê min, parêzgerê min! Fedora mezin dike, ez ne nexweş im. Lê do dema ez çûm ser goristana Volkovayê ku ez ji bo diya xwe ayînekê bidime xwendin, min hinekî serma girti bii. Ma çima hiin bi min re ne hatin? Min ewqas ji we lava jî kir. Ax, dayika min ya reben û mihêr, ku wê bikanî bîiya serê xwe ji gornê rakira û bidîta ka wan çi hanîne serê min!

V.D

20ê Buhara Paşîn

Berxika min, Varenka!

Ez hinek tirî ji we re dişînim, horiya min. Dibêjin, ji bo wan nexweşên ku ber bi başiyê diçe, baş e. Pêşniyarên doktoran jî ev e û dibêjin tîbûnê li merivan dişikîne, û loma ez dişînim. Çend roj berê, we çend gul xwesti bûn, ez wan jî dişînim. Lê hûn ji xwarinê re çawa ne, canekem, hûn dixwim, an ne? Ya herî girîng ev e. Şikir ji Xwedê re ew hemû rojên teng û xemgîn li me bihurîn. Şikir ji Xwedê re! Ku em vegerin ser pirsê pirtûkan, heta nuha min peyda ne kirine. Lê dibêjin, li vir pirtûkek pir baş heye. Min ew ne xwendiyê, lê ew yê ku xwendine pesnê wê didin li dibêjin, bi stîleke herî bilind hatiye nivîsîn. Min ji xwe re bi deyn xwest û wan jî soz dane min.

37

Lê ez nizamim, hûn ê jî bixwînin, an ne? Di \î warî de hiin ge-  
lekî nazdar in, ewqas ne rihet e ku meriv tiştê U gor dilê we  
peyda bike. Lewra ez bi we dizanim, kevoka min. Ji bêguman  
hiin ji helbestên evînî û dilpekîn hez dikin. Baş e, ez ê ji we re  
helbestan jî peyda bikim. Li vir, deftereke helbestan li ba min  
heye.

Ez gelek baş im, ji bo min tew hustuxwar nebin, dako. Ew  
hemû tiştên ku Fedorayê U ser min ji te re gotiye, ne rast in.  
Silavên min li wê zimandirêjê bike ii rasterast jê re bibêje, tu  
derewan dikî!... Min redîngotê xwe î nû jî ne firotiye. Dibêjin,  
ew ê di nêzîk de weke karxelat 40 rûbUên zîvîn jî bidine min.  
Ma ez ê çima kincên xwe bifroşim? Hûn dilê xwe teng nekin,  
dako. Fedora jineke şikebar e û di serê xwe de tiştan çêdike.  
Ji bo tiştên weha hiin xwe nerihet nekin, kevoka min. Li  
saxiya xwe binêrin û bi gavekê zûtir rihet bibin ku hûn min, vî  
pîremêrîji xemgîniyê bifilitînin! We ji kuderê bihîst ku ez jar  
ketime. Ev jî ji ber xwe derxistine, canekem! Şikir ji Xwedê  
re ez weke pîvaz im. Kîloyên min jî ewqas zêde bûne ku ji ber  
vê nepbdna xwe ez şerm dikim. Kêfa min li cî ye, dubare di-  
kim ku daxwaza min, tenê saxiya we ye! De bi xatirê we, ho-  
riya min. Wan tiliyên we yên hûrik ez yeko yeko radimûsim.  
Makar Devûşkîn

NOT: Canekem, ev çî ne ku we dîsa ji min re nivisandiye?  
Çi tiştên seyr in! Ma ez ê çawa hertim serî gavê werim mala  
we, horiya min? De ka ez ji we bipirsim. Ku we bivê ez di ta-  
riya şevê de werim, ma di vê demsalê de jî dunya tew tarî na-  
be ku! (\*) Di nexweşiya we de, dema hûn her bêhiş diketin,

hertim ez li paş serê we bîim, horiya min. Lê anuha têngêhîj-  
(\*) L/ Petersbûrgê û li hemû ciyên bakur, ji buharapa^n heta  
havînapaşîn dunya heta derengî ^evê jî her ronahî ye. WW

38

im ku bi çî awayî min ev tişt kir. Dûre jî min hatûçîiya xwe  
birî, lewra hawirdora me pê hesiya bûn û li pey me dipeyvîn.  
Gotinên ku ji nuha de têne kirin, bi têra xwe zêde ne. Bawe-  
riya min bi Teresayê heye, ew ne zimandirêj e. Lê dîsa jî divê  
hûn li ser bifikirin, dako. Diire ku xelk pê bihesin, kî dizane  
wê çaxê ew ê li ser me çî bifikirin xi çî bibêjin?... Canekem, ji  
ber vê yekê jî xwe ragirên heta ku hûn baş dibin. Dûre em dî-  
sa dikanin U dereke derveyî malê hevdu bibînin.

lê Havîna Pêşîn

Makar Alekseyevîçê hêja!

Ji bo xwîngermiya we ya li hemberî min, xemgînî ii dijwa-  
riyên ku we ji bo min kişand, ez jî fikirîm ku tiştêkî bikim ii pê  
we kêf!cweş bikim. Di dawîya dawîn de ez rabûm min dolaba  
xwe vekir, li deftera bîranînên xwe geriyam û min dît. Ez anu-  
ha wê ji we re dişînim. Di demeke bextiyariya jiyana xwe de  
min dest bi nivisandina wê kiri bû. Di warê jiyana min ya berê  
de, li ser diya min, Pokrovskî, ew demên ku min li ba Anna  
Fedorovnayê buhurand û ew xirabiyên ku di vê dawiyê de bi  
serê min de hatin, we hertim bi mereqdarî ji min dipirsî.  
Xwedê dizane ka bi çî ramanê, lê ev deftera ku min hinek de-  
mên jiyana xwe lê nivisîye ii we jî pir dbcwest ku hiin bbcwînin,  
ez jî bêguman bawer dikim ku hûn ê pê kêfxweş bibin. Lê de-

ma ku min ji nû ve xwend, xemgîniyekê bi min girt. Bi min wusa hat ku ji nivisîna rêza dawîn û vir de, ez bi ewqasî din jî pîr biime. Min ev bîranînên xwe di demên cuda cuda de nivisandiyê. Di xweşiyê de bimînin, Makar Alekseyevîç! Bêhna min gelek teng e û bêxewî jî rihetiyekê nade min. Çi nexweşiyê cankûçik e!

V.D

39

(I)

Dema ku bavê min mir, ez hew çardehsaU bîim. Di jiyana min de bextiyartirîn dem, dema zaroktiya min bû. Ê ew dem jî li vir ne, ji vir diir, li perê gundekî dest pê kiri bû. Bavê min li gundê T'ê, di wargeheke mezin de kîxa bû. Xwediyê wê prens P. bû. Bi jiyaneke bextiyar û bêdeng em U gundekî prens diman. Ez wê çaxê piçîikek şîim bûm. Li wan mêrg, devî, bexçan dibeziyam ii dilîstim. Karê min ev bii ii kesekî xwe têkilî min ne dikir. Bavê min, ji ber kariibarên xwe wext ne didît ku serê xwe bbburîne. Karê diya min ji serê wê zêtir bû. Herweha tişteki ku wan fêrî min bikira tune biî û ji vê yekê jî ez kêfxweş bîim. Pirî caran ez sibê zû radibiim, an min berê xwe dida golê, an deviyam, an dewsa bênderan, an jî ez dibeziyam nav pirêzan. Kelkela germa nava royê ne xema min bfi. Heta ku min dbcwest ez ji gund diir diçîim. Min guhê xwe ne didayê ku dirik ii pejikên dar û deviyam bi kincên min dikevin ii li min diperitînin. Ew peyvên ku dîire li malê li ruyê min diketin, ez bi wan jî ne dêşiyam.

Ez wer bawer im, ku ez ji wî gundî derneketama ii heta da-

wiya jiyana xwe H wir bijiyama, ez ê her bextiyar bimama. Lê hîn di zaroktiya xwe de, ev ciyên ku min çavên xwe lê vekir, ji bêgavî min li cî hişt. Dema me koçbarî Petersbûrgê kir, du-wanzdehsalî bîim. Ax! Di wan amadegiyên koçbariyê de ew xemgîniya ku bi min girti hû, ez tew ji bîr nakim. Ez digirîyam û digirîyam. Lewra ew hemii tiştên ku min jê hez dikir, ez ji wan diirdiketim. Tê bîra min, wê çaxê min bi girî xwe havêt hustuyê bavê xwe ii ez li ber geriyam ku em hinekî din jî li gund bimînin. Bavê min li min hêrs bii. Diya min bi girîji min re digot û bi min dida zanîn ku em ji bo pêwîstiya karûbarên xwe diçin. Prens P'yê pîremêr miri bîi. Kesên ku ciyê wî girti biin, xwesti biin bavê min ji karê wî dfirbbdn. Bavê min hinek 40

perên xwe yên arizî dabii dest hinek kesên xwedîkar. Bi hêviya serastkirina rewşa xwe ya aborî, bavê min çêtir dîti bii ku ew bi xwe were ser karê perên xwe. Ev hemii tiştên ha diire diya min ji min re kat kir. Dema em hatin vir, H hêla Petersbûrgskaya Storonayê em bi cî biin û heta mirina bavê min jî em li wir man.

Ji bo min pir dijwar bii ku ez xwe hînî vê jiyana nû bikim. Em di payîzê de hatin Petersbiirgê. Dema em ji gund qetiyam, dunya xweş û germ bfi. Karfibarên gund li ber qedandinê bû. Li hawirdorên komikên geniman vîçevîçê refên çfiçikan bû vediniştin. Her dever şên ii rengîn bii. Lê dema em hatin bajêr, şûi fi şepeliya payîzê bfi, bi hêwayeke qirêj fi fetisokî bû. Li vir em rastî gelek rfiçikên merivên nenas, dilsar, bêhteng û mirfiztirş hatin. Bi awayekî me xwe bi cî kir. Di raxistina

mala nû de, teqûreqiya wê çaxê her di bîra min de ye. Bavê min tew U malê ne disekinê. Diya min bi gavekê jî vala ne dima. Bi her awayê wan ez ji bîr kiri biim. Di vê mala me ya nî de, sibeha şeva pêşîn ez bi xemgînê şiyar bfim. Pencera me li hemberî dîwarekî zer bû. Celba kuçê li gûzikê bfi. Kuçeyeke wusa bi hatîçiyeye zêde bii. Lê kesên ku cU kuçê re derbas dibfin, bi kinc û bergan xwe tev pêça bûn. Ji sermayê xwe didan hev fi diçiin.

Di mala me de, roj bi awakî xemgîn ii bêhtengîn dibuhurîn. Mîna ku me ne dost fi ne jî nas hebûn. Navîna bavê min û Anna Fedorovnayê ne xweş bii, deyndarê wê bû. Ji ber danîsitandinên kar hertim kesina dihatin. Di her hatina xwe de jî ev merivên ha hertim dipeyîlîn û bi dengêkî biUnd U hev diqêriyan. Piştî çûyîna van mêvanan bêhna bavê min teng dibû, xwe hêrs dikir, bêyî ku peyvek ji devê wî derkeve bi saetan di odê de diçii fi dihat. Di demên weha de ji tirsan deng bi min jî ne diket. Min jî pirtfikek digirte destê xwe, U quncikekî rfidiniştim fi min newêrî bfi xwe bilivanda.

41

Sê mehan piştî hatina me ya Petersbîrgê, ez li dibistana dewletê bi cî biim. Di destpêkê de di nava merivên biyanî de mayîn, bi min pir dijwar bii. Hemfi tişt xwînsar fî naşêrîn bû. Mamostên me hişk, keçên din jî bêrfi fi ez jî ewqas şermok biim ku! Bi disîplîneke



hişk, ji bo  
hertiştî danîna  
wextê,

naxwarina bi hev re, bêxwêbiina mamosteyan, ev hemû tiştên ha hîn di destpêkê de ez xemgîn fi bêhtengîn kiri bfim. Xew jî ne diket çavên min, di van şevên sar fi dirêj de bêhna min teng dibû, min pal dida fi ez digirîyam. Pirî şevan, dema ku hemfi xwendevanên din li ser dersên xwe yê kevn an jî yê nîi dbcebitîn fi bi hev re dipeyivîn, min jî xwe di ser pirtûkek xwe de xwar dikir, bêdeng lê dinêrî fi ez diketime xeyalên mala me. Ez diya xwe, bavê xwe, dadêya xwe ya pîr fi xevroşkên wê difikirîm. Ax, bi van ramanan re çi xemgîniyê digirte ser min! Tişteki herî piçûk î di mala me de, min bi kêfxweşî dihanî bîra xwe. Min gelek dixwest ku ez dîsa li malê, di oda xwe ya piçîik de, li ber semawerê, bi dê û bavê xwe re rûniştama. Li wî ciyê germ ii nas, min ê ji dil xwe bavêta hemêza diya xwe fi lê bipiçîkiyama.

Her ku ez li ser van tiştan diponijîm ii difikirîm, dilê min bêtir dikeliya, ez di xwe de digirîyam ii min hêsrên xwe berdidan hundurê xwe. Hişkê min ne li ser peyvikên fransî bû. Ji ber çênekirina darsa xwe ya sibê, wê şevê her min di xewna xwe de mamoste, madam îî keçên xwendevan didît û U ser dersên xwe min pesta digot. Lê sibetirê jî xuya dikir ku li ser darsa xwe ez tişteki nizanim. Wê çaxê jî weke tawanbarî ez li ser lingan dihatim rawestandî fi nîvê xwarina min ji min dihatê birîn. Ez hertim bêhteng fi xemgîn bfim. Di destpêkê de xwendekarên keç tinazên xwe bi min dikirin, di dersê de ez li hev şaş dikirim, dema em hemû bi hev re diçfin aşxanê,

destdirêjî dikirin û pê ez hêrs dikirim. Dfire jî ji bo tiştêkî herî piçûk giliyê min bi mamostê de dikirin.

42

Lê U gel van hemû tiştên ha jî, êvarên rojên şemiyên dema ku dadêya min dihat pey min, bi bextiyarî min xwe davête hemêza wê ii ez lê dipiçikîm. Wê jî kincên min li min dikir, ez germ dipêçam ii heta malê ez li pêşiya wê dimeşiyam ii her min jê re tiştina digot. Bi şayî û kêfxweşiyê wusa min xwe digîhand mal, min dê û bavê xwe ewqas maç dikir, nola ku min deh salan ruyên wan ne dîti be. Dfire ziman U min vedibii, min her digot fi kat dikir, xêriixweşî li herkesî dikir, ez dikeniyam, bi vir fi wir de U ser Hngan hol dibûm. Lê peyivîna min ii bavê min bi awakî bêhenek li ser zanistiya dersan, H ser mamostên me, li ser zimanê fransî fi gramera L'Homond dibû. Ê em hemû jî kêfxweş û bextiyar bûn. Êro jî, dema ku ez wan çaxan bi bîr tînim, dilê min şa dibe.

Ji bo ku ez hîn bibim û pê dilê bavê xwe xweş bikim, heta ku ji min dihat, min dixwend. Lewra min dizanî bfi ku bavê min heta quruşekî xwe î dawîn jî ji bo xatirê min U ber xwe dide. Roj bi roj gwînê bavê min bêtir divemirî, bêtir bêhnten<sup>^</sup> fi bêtir hêrs dibfi. Xwiyê wî xirabtir dibfi, karên wî U hev ne dihat fi heta ber qirikê keti bfi binê deynan. Ji bo ku bavê min hêrs nebe, diya min ne diwêrî bfi bigirîya fi ne jî peyv ji devê wê derdiket. Di bêdengiya xwe de jar fi xirabtir bû ii bi kuxikek xirab ket. Dema ku ez ji dibistanê vedigeriyam, hertim jî çavên min li wan ruyên xemgîn diket. Diya min bêdeng bêdeng digirîya û bavê min bi hêrs bfi. Dûre jî xirecir fi pevçfi-

nekê dest pê dîkir. Bavê min dida ber pozê min fi ji min re digot; H gel ku me hertiştê xwe daye ser xwendina te ii me xwe xizan xistiye, lê te dilê me xweş ne kiriye ii hîn bi fransî jî nikanî bipeyivî. Bi kurtebirî, gunehkariya hemii dijiwariyên ku em tê de, wî davêt ser min û diya min. Diya min ya reben, çawa devê merivan U wê digeriya?! Min lê dinêrî, agir bi kezeba min diket. Gupên wê keti bûn hev, çavên wê ji girî sor fi di kort de çfi bfin xwarê, gwînê wê rengê merivên bi jana zirav

43

dida. Zêdetir, min ji destê bavê xwe cUkêşand. Hertim ji tiştêkî piçfîk dest pê dîkir, dûre yek ji vir û yek ji wir dihanî û hêrs li xwe mezintir dîkir. Carina tew ez tînedigêhîştim ku ji bo çî jî hêrs dibe. Ku carekê devê xwe vebikira, êdî ne disekinî û her li ser zimanê fransî, li ser serhişkiya min, li ser ehmeqî ii bêşermiya mamosta dibistana me dipeyivî fi digot ku; wê ji bêrûtiya xwe bala xwe ne daye ser xwiye me î naxoş. Diire vedigeriya ser xwe ii gazin ji xwe dîkir ku wî hîna ji xwe re karek ne dîtiye. Çêlî gramera L'Homond dîkir fi digot zimanzanistiya Zapolskî pir fi pir çêtir e. Di ser min de dikire pilepil fi dida zanîn ku wî ji bo xwendina min pêşek pere rijcuidiye fi xuyaye ez yeke bêpêjn fi dilkevîr im. Lê ez keçika reben, bi kurtî, ji bona ku ez peyvik fi hevokên fransî ji ber bikim, bi her awayî min xwe dida xwendinê. Lê dîsa jî, ya ku xirab dibî, dîsa ez bîm! Ev ne ji wê yekê bî ku bavê min ji min hez ne dîkir. Ji min jî fi ji diya min jî gelek hez dîkir, lê xwiye wî wusa bî.

Serneketin, xemxwarî ii ev hemfî tiştên bêyom rewşa bavê

min î reben xirab kiri bii. Pirî caran hêviya wî dişikest. Dev ji saxî ii rihetiya giyanê xwe berda, serma girt ii nexweş ket. Piştî vê nexweşiya xwe jî di wexteke pir kurt de ji nişka ve ket ii mir. Ev mirina wî ya weha zii, dest fi Hng li me girêda û heta çend rojan jî hiş ne hat serê me. Sergêjiyeke wusa girte ser diya min ku ez ditirsiyam ew ê hişê xwe wenda bike. Di pey mirina bavê min re weke mişkên ku ji qulên xwe derkevin, ji her aliyê ve xwediyên deynan girtin ser me. Bi şeş meha piştî hatina me ya vir ew xaniyê me yê pişûk î ku bavê min li Petersbiirgskaya Storonayê kirî bû, ji dest me çû. Hemfi tiştên me yê ku hebiin, me firotin. Ez nizanim ew deynên mayî bi çi awayî hatin dayîn, lê em bi xwe rûtûrepal, bê cî fi war man. Diya min bi nexweşiyeke bêderman keti bfi, em zikekî têr yekî birçî biin. Tiştê me î ku em pê bijiyar ne ma bû û perîşa-

44

niya me U qirikê bii. Min wê çaxê nû çardehsaliya xwe tijî kiri bû.

A di wê demê de carekê Anna Fedorovna hate ba me. Her çêlî wargeha xwe dikir ii li gor gotinên wê, em ii wê merivên hev dihatin. Diya min jî çêlî merivatiya xwe û wê dikir, lê pir ji diir ve. Dema ku bavê min sax bfi, tew ne dihate mala me. Lê roja ku hat, bi çavên girî xemgînî fi dilşewatiya xwe ya ji bo vê rewşa me da xuyakirin fi da zanîn ku ev hemû tiştên ha ji ruyê bavê min de bûne, bi pozbilindî wî quretiyên ji xwe mezintir kiriye, digot, daxwaza dilê xwe bi lêv dikir ku em wan hemii tiştên buhurî ji bîr bikin û bi hev re têkevin danfisandinên merivatiyeke germ. Lê dema ku diya min pê da zanîn

ku tu carî dilê xwe ji wê teng ne kiriye, bir ii berda girî. Diire wê diya min bi xwe re bir dêrê ii ji bo «miriyê xoşewîst» (Ji bo bavê min, wê weha got.) ayînek da xwendinê. Piştî ayînê bi diya min ve rasterast li hev hat.

Anna Fedorovnayê berê dfiriidirêj çêlî xizanî, dijwarî fi bêhêvîtiya me kir ii bi her awayî rewşa me da xuyakirin, dfire pêşniyarê me kir ku em di mala wê de bimînin. Wê jî weha bi lêv kir. Diya min sipasî wê kir, lê heta demeke dirêj jî bêbiryar ma. Lê ji ber ku tu riyeke din li pêş xwe ne didît, rabû malavatî li Anna Fedorovnayê kir fi pê da zanîn ku me pêşniyara wê ji serê xwe qebiil e. Wê sibeha ku me ji Petersbfirmgskaya Storonayê koçî girava Vasîlyevskîyê kir, weke îro tê bîra min. Hişkesar fi sayiya sibeheke payîzê bû. Diya min digirîya û ez gelekî xemgîn bîm. Diltengiyeye nependî xwe girti bfi ser ruhê min. Demeke giran fi dilêşîn bfi...

(11)

Di destpêkê de min fi diya xwe, me gelek dijwarî kişand heta ku em hînî vî ciyê xwe î nfi bûn. Anna Fedorovnayê di 45

kuça şeşan(\*) de ji pênc odên xweşik xaniyekî wê hebû. Sê odên xênî, Anna Fedorovna ii dotmama min Şaşa tê de diman. Weke sêwiyekê, di piçiiktiya xwe de heta nuha li ba Anna Fedorovnayê dihat xwedîkirinê. Di oda çaran de ez ii diya xwe diman. Di oda dawîn ii ya kêleka me de jî, bi navê Pokrovskî xwendekarekî xizan bi kirê tê de dima.

Anna Fedorovna xwediyê jiyaneke gelekî baş bû. Ji qasî ku meriv tê derdixist dewlemendtir bû. Lê hatinên dewlemen-

diya wê jî, bi qasî tiştên ku wê fikir, nependî bûn. Hertim mîna ku karekî wê î nîvçe hebe, rojê çend caran bi duruşkê an jî peyatî derdiket ii dihat. Lê ne gengaz bii ku ez têbigêhîjim ka çi dike fi xwediyê çi karî ye. Bi gelek kesên têvel re daniisitandinên wê hebii. Birek merivên nenas li wê dibfin mêvan fi Xwedê dizane bê çi kes biin, lê hemii jî ji bo karekî dihatin fi di dest de jî diçiin. Her cara ku yekî li zengilê derî dbdst, diya min ez davêtime baş derê oda me fi derî li ser min digirt. Ji ber vê yekê Anna Fedorovna pir ji diya min hêrs dibfi, bi saetan di ser me de dikire birebir ku em gelekî payedar in û pêwîst nake em xwe wusa pêşan bidin. Di wan deman de ez tînedigêhîtim ku bi mebesta payedariya me ka ew dixwaze çi bibêje. Lê ez anuha tîgêhîştîm ku an jî bi gotineke din min tîdcrist ku li gel daxwaza Anna Fedorovnayê, çima diya min ne dixwest li mala wê bimîne. Ew jineke xirab bii ii çavsorî U me fikir. Ji bo min hîn wek pirseke sergirtî ye ku wê çima wê çaxê pêşniyarî me kir ku em di mala wê de bimînin. Di demên pêşîn de li hemberî me gelekî merva bfi. Lê piştî ku tîgêhîştî êdî me kesek nîne ii ciyê ku em pêde biçin tune, wê çaxê rastiya ruyê xwe da xuyakirin.

Diire wext buhurî ii ew li hemberî min guherî. Heta ku bivê, ew nazik ii dilovane bfi fi dbcwest dilxweşiya min bigirê. Lê (\*) Kuçekekji kuçên taxa Vasîlyevskaya Petersbûrgê ye. WW  
46

bi rastî jî di demên pêşîn de, wek diya xwe min jî pir ji destê wê kişand. Hergav bi me re pevdîçînî ii çêyiyên xwe dida ber pozê me. Wê, em wek merivên xwe yê xizan bi xelkê didan

naskirinê û digot: «Jineke bî ii keça xwe ya sêwî ye.» ii wê ji bo Xwedê em di mala xwe de hewandine. Li ser xwarinê çavên xwe ji me ne dikuta ka çend parî di gewriya me de diçe xwarê. Ku me nexwara, wê ev yeka jî li me digirt fi digot: «Xwarin ne bi dilê wan e! Xwarinê hilnebijêrin, Xwedê çi xwarin kiri be malê, ez wê didime ber we. Ma di mala we de ji viya çêtir bi dest we diket!» Hertim dev davêt bavê min û digot: «Xwe di ser herkesê re girt fi xwest ji wan çêtir bijî, lê karê wî li hev ne hat. Jin ii keça xwe bi kuçan xist. Ku meriveke wan ya dilovan ii xiristiyanekê oldar jî ew di mala xwe de nehewanda, Xwedê dizane ka bê ew ê têketana çi rewşê. Kî dizane, dibe ku li kuçan ji birçîna bimirana!» Ma wekîdin çi ne digot ku! Tiştên ku meriv dibihîst, ji dilêşinê bêtir dilverîşin bfin. Diya min her digirîya. Saxiya wê her roj xirabtir dibii, bi awakî berbiçav jar diket ii diheliya. Li gel vê yekê jî ez û diya xwe, me karê dirfinê digirt fi ji sibê heta êvarê me kar dikir. Lê Anna Fedorovna ji vê yekê jî nerihet dibii ii digot; mala min ne dirûnxana modayê ye. Lê diviya bii me li hêlekê hinek pere bida ser hev ku em bikani bin ji xwe re kincan bikirin û pêwîstiyên xwe yên mayî berteref bikin. Bi hêviya ku em ê rojekê bikani bin koçî dereke din bikin, heta ku ji me dihat me perê xwe berhev dikir. Lê ji ber vî karî, saxiya diya min bêtir û bêtir xirab dibfi, her roja ku lê dibuhurî, hêle di wê de ne dihişt. Nexweşî, weke kurmekî keti bfi saxiya giyanê wê ii ber bi mirinê dikişand. Min ev bi çavên xwe didît, min bi xwe jî hîs dikir ii herweha dilê min jî di ber de dişewutî. Bi vî awajî rojan didane pey hev û derbas dibiin. Mîna ku tew em li bajêr nejîn, jiyana me bi her awayî bêdeng dibuhurî.

Piştî ku Anna Fedorovna bi desthilatiya xwe ewle bii, hêdî  
47

hêdî bêhna wê jî fere dibfi. Ji xwe kesek ji me ne difikirî ku tiştêkî ji wê re bibêje. Oda me û wê bi korîdorekê ji hev hati bii veqetandin. Weke ku min berê jî dabfi xuyakirin, oda me fi Pokrovskîyê xwendekar bi hev ve bû. Fransî, almanî, dîrokna-sî, geografî fi wek ku Anna Fedorovnayê digot, wî hemii zanist hînî Şaşayê dikir. Ji bo vê yekê Anna Fedorovnayê ev xortê ha têr dikir û di mala xwe de dihewand. Şaşa keçeke kaw fi şerfit, lê zîrek bfi. Di wan deman de sêzdehsalî bii. Anna Fedorovnayê pêşniyarî diya min kir ku ji bo min ê baş be ku ez jî beşdarî vê dersgirtinê bibim, lewra min hîngirtina xwe ya li dibistana dewletê nîvçe hişti bfi. Diya min ji vê yekê pir kêfxweş bfi fi rasterast salekê min bi şaşayê re ders ji Pokrovskî girt.

Pokrovskî xortekî pir fi pir xizan bfi. Nesaxiya giyanê wî dest ne dida ku bi rêkiipêkê xwendina xwe bidomîne. Navê xwendekariya ku li wî bfi bû, xwiyekî kevn bû ii ji berê de dihat gotinê. Ewqas nefspiçfik û bêdeng dijiya ku tu dengê ji oda wî ne dihat bihîstin. Ji derve de xwediyê bergeheke gelekî seyr bii. Rêveçfina wî jihevketî fi bi sistûpistî silav hildida. Peyivîna wî ewqas seyr bû ku di demên pêşîn de, wexta min U wî dinêrî kenê min ne disekinî. Bi taybetî di dersan de şaşa diket kirê wî ii pê tinazên xwe dikir. Merivekî hişk bfi, zû tfire dibû, ku me piçekî nerindî bikira tavUê hêrs dibû fi di ser me de dikire pilepil. Pirî caran di nîvê dersê de hêrs dibii, diket oda xwe ii heta êvarê ji ser pirtûkên xwe ranedibfi. Gelek pir-



tiikên wî yên hêja û nadîde hebfin. Li derve jî bi peran ders dida ii perên ku ji wir bi dest diket, taviê diçfi û ji xwe re pê pirtfik dikirîn.

Her ku çii min ew baştir û ji nêzîk ve nas kir. Merivekî dilpak, baş fi giranbuha bû. Heta wê rojê jî ez H yekî woisa rast ne hati biim. Diya min pir riimet dida wî. Dfire, (piştî diya min) ji bo min jî bii hevalemî herî baş.

48

Di destpêkê de li gel ku ez mestiimezin jî biim, ez bi xwe jî diketim nerindiya tevgerên Şaşayê. Bi saetan me serê xwe di ber de dêşand ku em ê bi çî awaji bikani bin Pokrovskî hêrs bikin ii ew jî li me bike qêrîn. Dema ku tiire dibû, rewşeke komîk digirte ser vw fi em ji vê yekê kê&cweş dibiin. îro jî dema ku ez vê yekê bi bîr tînim, ez şerm cUkim. Rojekê me ew wusa hêrs kir ku hindik ma bû bigirîya ii min bihîst ku di ber xwe de hêdîka dibê: «Zarokên cHlkevîr!» Ji nişka ve ruyê min sor bii, min şerm kir ii dilê min pê şewutî. Tew ji bîra min naçe ku ez heta binê guhên xwe soromoro bfim fi hêrs bi çavên min ket. Min jê lava kir, U ber geriyam ku bêhna xwe fere bike fi van henekên me yên ehmeqane li dilê xwe negirê. Lê v/î pirtfika xwe pevxiist fi di nîvê dersê de rabfi çû oda xwe.

Wê rojê heta êvarê poşmaniyeye mezin bi min girt. Me pirî caran ew weha kelagirî kiri bfi fi her ku ez H ser difikirîm, dilê min bêtir pê dişewutî. Me xwesti bii ew bigirî, me dUê wî teng kiri bû û di dawiya dawîn de jî em bi ser keti biin ku ev xortê reben xwe di vê rewşê de bibîne. Ji xemgînê û poşmaniyê wê şevê heta sibê xew ne ket çavên min. Dibêjin ku poş-

manî dilê merivan rihet dike, lê ne wusa ye. Xwedê dizane payedarî jî tevlihevî xemgîniya min dibii. Min ne dixwest Pokrovskî min weke zarokekî bibîne. Di wan çaxan de ez êdî panzdehsalî bûm.

Ji bo ku Pokrovskî nerînên xwe yên H ser min biguherîne, ji wê rojê ii pêve min dest pê kir fi hezar plan di serê xwe de çêkir. Lê rewşa şermokî fi gunehkariya min rê ne dida ku ez biryarekê bistînim û ev fantaziyên ha her di serê min de bûn. Lê belê ew nerindiyên ku Şaşayê dikirin, min xwe jê vedikişand. Pokrovskî jî êdî hêrs ne dibfi. Lê ev jî ne dibfi berkela ber dilê min.

Ez ê anuha çend gotinan H ser merivekî bikim. Balkêştir, seyrtir fi rebentir merivekî ku ez di jiyana xwe de lê rast hati-  
49

me. Li vî beşê notên xwe, sedema ku ez ê çêU wî bikim ev e ku heta wê çaxê jî vî merivî tew bala min ne kişandi bû. Lê diire ji nişka ve hertiştê Pokrovskî bala min kişand.

Carina rîsipyekî bi bejneke kinikî, kincên qirêj û pertiU, seyr û şermok dihat mala me. Bi mêzekirineke pêşîn re meriv digot qeyê ji tiştêkî an jî ji hebfina xwe şerm dike. Her xwe dida ser hev û xwe diguvişand, dest û lepên xwe U ba dikir ii dev ii pozê xwe xwar dikir. Yekî ku lê binêriya ew ê bigota ev ji serê xwe kêm e. Dema ku dihat mala me, U ber diwarê pêşberî deriyê camîn disekinî û newêrî bû têteta hundur. Ku ji me yeka ku wî nas dikir; ez, şaşa an jî destirmaneke malê di ber wî re derbas bibiyya, destê xwe jê re li ba dikir, xwe dida ser hev ii dest bi îşarên xwe yên têvel dikir. Ku me jî li gor

peymana xwe piçekî serê xwe xwar bikira an jî ew bi nav bikira, têra wî fikir ku ew têbigêhîje kesekî biyanî li malê tune ye fi ku ew bbcwaze dikane têkeve hundur. Wê çaxê jî pîremêr hêdîka derî vedikir, pişirînên kêfxweşiyê bi lêvên wî diketin, bi dibcweşî destên xwe di hev re dida û bédeng berê xwe dida oda Pokrovskî. Ev, bavê Pokrovskî bû.

Ez dûre çîroka jiyana vî pîremêrî dûriidirêj tégêh<sup>^</sup>tim. Di wextekê de ev li derekê kar dike. Ji ber bêkêrî ii lepdarîniya wî, hertim karên sivik û piçûk didine ber wî. Piştî ku jina wî ya pêşîn (Diya Pokrovskîyê xwendekar) dimire, vê carê ji malmezinan ji xwe re keçekê dbcwaze û pê re dizewuce. Bi vê zewaca nfi re, di malê de hertişt serfîbinî hev dibe. Jinik nahêle kesek çavê xwe veke û hertiştî dbce destê xwe. Pokrovskîyê xwendekar wê çaxê lawikekî dehsale ye. Dêmariya wî gelekî çavsoriyê lê dike. Lê Xwedê li ruyê Pokrovskî mêze dike. Xwedîwargeh û dewlemendekî bi navê Bukov di wextekê de karhevalê bavê wî ye. Ew di bin sitara xwe de Pokrovskî dide ber xwendinê. Sedema vê yekê jî ev e ku Bukov diya wî ji keçaniya wê de nas dike loma. Bi dest fi alîkariya Anna Fedo-  
50

rovnayê keçik bi Pokrovskîyê mezin re tê zewucandin. Mîrza Bukovê ku baştirîn hevalê Anna Fedorovnayê ye, radibe wek xelata zewacê pênc hezar rûbilî dide biikê. Lê kes pê nizane bê ev perên ha çi lê hat. Ev hemii tiştên ha Anna Fedorovnayê ji min re kat kir. Pokrovskiyê xwendekar tew hez ne dikir ku çêlî jiyana malbata xwe bikira. Li gor ku tê gotin, diya wî pir xweşik biiye. Lê bi min gelek seyr e ku çawa bi karmen-

dekî wusa sivik re zewuciye. Di ciwaniya xwe de, çar salan piştî zewaca xwe miriye.

Pokrovskîyê piçfik piştî dibistana xwe ya pêşîn diçe jîmnazê(\*) û dfire jî diçe unîversîtê. Mîrza Bukovê ku pirî caran tê Petersbiirgê û diçe, lêwîk bi tenê nahêle. Lê Pokrovskî ji ber pêldayîna nesaxiya xwe nikane xwendina xwe bidomîne. Li ser vê yekê Mîrza Bukov wî bi Anna Fedorovnayê dide naskirin ii pêşniyar dike ku bi hoya nanzikî Pokrovskî xwe bide ber hîndayîna Şaşayê.

Pokrovskîyê mezin, ji ber destê jina xwe ya nfi dest bi vexwarinê kiriye fi her serxweş bûye. Jina wî lê xistiye, havêtiye paş deriyê aşxanê, lê piştî demekê mêrik êdî wusa hînî sîle û neheqiyar bfiye ku tew gazin jî ne dikir. Li gel ku salên wî ewqas ne zêde bii, lê dîsa jî ji ber hinek xwiye xwe yên naxoş diket rewşeke xerifînê. Ji pêjnên malmezinî ii merivatiyê tiştetek tenê bi wî re ma bii; ew jî, bi hezkirineke bêpîvan ji lawê xwe hez dikir. Li gor ku dihate gotin, Pokrovskî pir ii pir H diya xwe ya rihmetî diçfi. Diya wî jineke xwîxweş fi dUkelîna mala xwe bfiye. Dibe ku ji jina v/î, gelek bîranînên wusa xweş jê re ma biin û loma mêrik ewqas pir ji lawê xwe hez dikir. Pîremêr ji bilî lawê xwe çêlî tiştêkî din ne dikir ii hertim bi awakî rêkfipêk di heftekî de du caran dihat serlêdana lawê xwe. (\*) Jîmnaz: Di rûsiya kevn de navê dibistanekê ye ku hîndayîna nawendî lê dihat kirinê. JVW

51

Zêdetir jî newêrî bû bihata, lewra Pokrovskî ji serlêdanên bavê xwe naxoş bii. Li ba Pokrovskî bê şik kêmasiyeye mezin

hebii ku ew li hemberî bavê xwe bêgiram bû. Lê bavê wî carina dikete rewşên wusa ku tew ne dihat kişandin. Berî hertiştî pir mereqdarê tiştan bii, ya din, bi peyvên xwe yên vikûvala ne dihişt ku lawik bi serekî zelal dersên xwe bbcebite. Ji xwe carina jî bi serekî serxweş dihat. Lêwik hêdî hêdî ev xwiyên naxoş ji ser bavê xwe hilanî. Pîremêr êdî pozê xwe di hertiştî re ne fikir ii zêde jî ne dipeyvî. Bi giramî her guhdariya lawê xwe fikir û heta ku kurê wî îcaze ne dabfiya wî, wî devê xwe venedikir.

Pîremêrê reben ji dîyîna Petenkayê (Wî lawê xwe weha bi nav dikir.) xwe têr ne dibii. Dema ku dihat serlêdana kurê xwe, baş xuya fikir ku bi şik e ka lawê wî ê bi çi awa>i pêrgî wî were. Lewra di her hatina xwe de mîna ku xwe ji tiştêkî vekişîne nerihet, xemxwar ii bi raman bû. Ji bo ku nekeve hundur, weke hertim heta demeke dirêj jî U ber derî radiwestiya, ji xêra Xwedê re ku ez lê rast bihatama, dest pê fikir pirs H ser pirsê ji min fikir ii dicarand. «Petenka çawa ye, baş e? Rihe-tiya wî li cî ye, an ne? Çi dike, na xwe mijilî tiştêkî girîng e? Dinivisîne, an li ser tiştêkî girîng difikire?» Piştî bersivên ku min dida wî, ew pê rihet ii wêrek fikir, rebeno jî wê çaxê biryara xwe dida ku têkeve hundur. Bêdeng derî vedikir, berê hêdîka serê xwe dirêjî hundur fikir, dema didît ku kurê wî ne bi hêrs û bêhteng e, bi serhejandina xwe xêrhatinê lê dike, wê çaxê hêdîka gava xwe davêt hêla hundur, paltoyê xwe ji xwe fikir, kepê xwe î riziwayî û qeraxê wî pertiH digirte destê xwe û dîsa bi wê bêdengiyê bi bizmarekî kincan ve fikir. Dû-re li quncikekî, li ser sandaliyekê cî dida xwe ii çavên xwe ji lawê xwe ne dikuta. Bi çavên xwe her tevgerek kurê xwe da-

diwerivand û dbcwest têbigêhîje ka kêf û rihetiya Petenkayê wî li cî ye, an ne.

52

Ku pîremêr têderxista bêhna kurê wî piçekî jî teng e, tavilê ji ciyê xwe radibû fi kat fikir ku ew tenê ji bo gavekê hatiye fi digot: «Ez gelekî li ser Hngan geriyam, li ser riya xwe min got ez weha hinekî westa xwe bigirê.» Diire dîsa bê peyv fi bê deng diçû palto û kepê xwe ji bizmar dadbdst, dîsa hêdîka derî vedikir, bi derketina xwe re bi dijwarî dipişu-î li pê xemgîniya di hundurê xwe de vedişart ku kurê m pê nizani be. Lê dema ku kurê wî bi rfikenî pêrgî wî bihata, ji kêfxweşiya xwe pîremêr nizanî bû çî bikira. Ev kêfxweşî ji ruyê wî û ji her Uveke wî diyar dibû. Ku kurê wî tiştêk jê re bigota, pîremêr ji ser sandaliyê nîvçe radibii, xwe diguvişand ser hev, bi awakî fermî û oldarî hêdîka bersiv dida. Di peyivîna xwe de bala wî her H ser hevokên bijarte bû ku bi kar bîne, lê ya rastî metelokên pêkenînê biin. Lê bi awakî din î xweş nikanî bii bipeyiviya. Hertim xwe li hev şaş fikir, ji şermesariyê soromoro dibfi û nizanî bii ka ew ê çî bike fi xwe di kuderê de binuxumîne. Piştî peyivîna xwe mîna ku bbcwaze wê bersiva xwe serast bike, heta demekê jî her xwe bi xwe dikire pilepil. Lê ku bi ser biketa ii bersiveke baş bida, wê çaxê xwe ji hev dikişand, êlegê xwe, hustumala xwe, frakê xwe serast fikir ii diket rewşeke payedar. Di demên weha de carina bê tirs ji ciyê xwe jî radibii, hêdîka ber bi pirtîkxana malê diçû, pirtûkek jê derdbdst û tew tavilê ji derekê dest bi xwendina wê jî fikir. Bi awakî wusa ewle û rihet ev tiştên ha fikir, yekî ku nizanî bûya

ew ê bigota, ev hertim wusa bê îcaze dikane dest bide pirtii-  
kên kurê xwe ii mîna ku kurê wî jî pê pesnê wî bide, tew bala  
xwe ne didayê. Lê carekê, dema Pokrovskî jê tika kir ku ew  
destê xwe bi pirtii-kê wî neke, ez tenê dizanim bê ev rebena  
çiqasî tirsîya! Bi ken ziizfika pirtfik serjêr xiste ciyê wê. Dûre  
xwest ku wê rast bike, vê carê berûpêş bi cî kir. Dipişirî, soro-  
moro dibfi fi nizanî bfi ku ew ê bi çî awayî pirtfikê rast bi cî  
bUce.

53

Pokrovskî bi şîretên xwe yên baş hêdî hêdî pîremêr jî ji  
xwiye wî yên naxoş dûrdbdst. Dema lêwik du sê caran H ser  
hev dît ku bavê wî ne serxweş e, di serlêdanên pey re her cara  
ku derdiket û diçii, lawik bîst û pênc, pênce kopêk dida wî fi  
tew carina zêdetir jî didayê. Carina jî jê re potîn, hustumal fi  
êleg dikirî. Dema ku pîremêr xwe di nava van ciliibergên nfi  
de didît, xwe wekî dîkekî qure dikir. Carina dihat ba me jî.  
Weke diyarî, sêv û kulorên şêrîn ji min û Şaşayê re dihanî ii  
hertim çêlî Petenkayê xwe dikir. Ji me tika dikir ku em der-  
sên xwe baş bbcwînin, baş guhdariya Petenka bikin ii her kat  
dikir ku Petenka kurekî baş, kurekî nimfine ii herweha kurekî  
gelekî zana ye. Bi peyivîna xwe re bi awakî wusa komîk çavê  
xwe î çepê dişikand fi diket rewşeke wusa seyr ku, ken U me  
ne disekinî fi dibfi biqîna me. Diya min pir ji wî hez dikir. Li  
gel ku pîremêr ewqas ji Anna Fedorovnayê xwî jî dikir, dîsa jî  
li hemberî wê dest ii lingên wî girêdayî bû.  
Piştî demekê min dersgirtina xwe U ba Pokrovskî birî. Wî  
weke berê hîna ez nola zarokekê didîtîm, zarokek ku fena Şa-

şayê şûm fi nerind. Ji vê yekê ez pir dêşiyam. Lewra heta ku ji destê min dihat, min dbcwest ez wan tevgerên xwe yên berê bi wî bidime jibîrkin. Lê tew bala wî ne dikişand fi ji ber vê yekê ez bêtir tetirxanî dibfim. Ji bilî dersan ez qet bi Pokrovskî re ne peyivî bûm ii ji xwe min nikanî bfi jî. Ez soromoro û tije dibfim, dfire vedikişiyam quncikekê û ji kerbana bi dizî digirîyam.

Min nizanî bû ka ew ê dawiya vî tiştî bi çî awayî biqede. Lê dûre sedemeke seyr, bii sedema nêzîkbûna min ii wî. Şevêkê dema ku diya min li ba Anna Fedorovnayê riinişti bii, ez jî hêdîka derbasî oda Pokrovskî bfi. Min dizanî bfi ku ew ne U mal e, lê ez têngêhîştîm ku ez çima çfim oda vn. Lewra ev ji salckê bêtir bfi ku odên me bi hev ve biin. Li gel viya jî heta nuha min gava xwe navêti bû oda wî. Dilê min wusa davêt ku

54

min digot ew ê ji defa sîngê min derkeve der. Bi mereqdarîyeke taybetî min li dora xwe nêhirî. Oda wî gelekî xizan fi bi awakî tevlihevî hati bii raxistin. Li ser mase ii sandaUyan kaxez ii pirtfik hebûn. Di wê gavê de ramanê gelekî xirab di serê min de vejînî ii di dilê min de bii wek kulekê. Bi min wusa hat ku hevaltî fi hezkirina dilê min ê ji bo wî wek tişteki pir piçfik be. Ew merivekî xwenda bii. Ê ez jî naşiyek biim, min tişteki nizanî bû fi min pirtûkek jî ne xwendî bû... Min bi çavnebarî li wan refikên ku ji pirtfikan dagirtî nêhirî. Hêrs, xemgînî ii bêhtengiyê tev girte ser min. Dilê min xwest ku ez bi gavekê zîtir van pirtîkên wî hemûyan yek bi yek bixwînim. Ji min wetrê ez, ew hemii tiştên ku wî dizanî bû hîn bibiiyama,



wê çaxê ez ê bibiyama hevaleke li gor wî. Min xwe gîhand re-  
fika pêşîn, bêyî ku ez xwe ji tiştê bidime hev û bifikirim ka  
ez çi dikim, min kevnepiirtûkek bi tozîtewar kişand û girt. Sor  
ii zer bûm, ji tirs ii dilpekiyê ricifim, min piirtfik girt û bir oda  
me. Ez fikirîm ku piştî raketina diya xwe, ez ê li ber ronahiya  
findê bixwînim.

Lê piştî ku ez derbasî oda me bûm ii min piirtiik vekir, çi  
bibînim, nîvê riipelên wê kurmî ii kufikî bîne, bi xwe jî kevne-  
piirtfikek latînî ye. Ez pir qehirîm. Ji bo ku ez vê piirtfikê dîsa  
daynim ciyê wê, ez vegeyriyam oda Pokrovskî. Ez hîn xerikî  
piirtfikê bîm ku di ciyê wê î refikê de bi cî bikim, ji hêla korî-  
dorê de dengên Ungan nêzîk hat. Min kir ku ez zîzîka piirtû-  
kê bi cî bikim, wext jî pir ii pir kêmbii. Lê mbcabin, refik  
wusa teng hati bî nişandin ku dema min ev piirtiika sitiir jê  
kişandi bî, piirtiikên din xwe sist berda bûn, xwe gîhandi bî  
hev ii ji bo viya cî ne ma bî. Heta ku ji min hat, min piirtiik  
dewusand ciyê berê. Bizmarekî zengariyê ku refik pê ve, mî-  
na ku U bendî vê gavê bî ji nişka ve şikiya, hêleke refikê da-  
ket xwarê, piirtfikên tê de bi teperep ketin ii li derfidorê belav  
bî. Di wê gavê de derî vebii û Pokrovskî kete hundur.

55

Divê ez viya jî bidime zanîn ku Pokrovskî ne dbcwest kesek  
têkeve oda wî ii dest bide tiştan. Tew ku yekî dest bi piirtûkên  
wî bikira! Tirs ku girte ser min êdî hiin bi xwe bifikirin; piir-  
tûkên bi her babetî; sitfir, piçîik fi mezin ji refikê gêrî xwarê  
biin, li rasta odê, li binê mase û sandaliyan belav bî. Min  
xwest ku ez ji wir diirkevim, lê ez dereng ma bûm. Min di dUê

xwe

de

got:

«Hertişt

qediya!

Ez êdî çfim!

Wek

zarokek

dehsale ez şfimiyan dikim... Ez keçikek ehmeq, dînikek mezin im!»

Pokrovskî pir û pir hêrs bû ii got:

- A ev ji min kêmbû, ha! Ma hiin ji ber van nerindiyên xwe şerm nakin? Hfin ê kengî dev ji van şfimiyan berdin?

Û dûre xwarî pirtiikan bû ii dest bi berhevkirina wan kir.

Ez jî xwar biim ku pirtiikan ji erdê berhev bikim. Lê ew qêriya û got:

- Pêwîst nake, dev jê berdin! Ciyê ku kesî banî we ne kiri be, baştir e ku hûn neçine wir.

Lê li gel vê yekê jî ew tevger û rawestina min ya bêdeng, poşmaniya min bi wî dida xuyakirin. Loma bêhna wî hinekî fere bii, bi dengê nizm fi bi mafê mamostekî min î kevn gotinên xwe bi şîretan domand:

- Hiin ê kengî hişê xwe bidin serê xwe fi baqil bibin? Ca li xwe binêrin, hiin êdî ne zarok in jî, hiin keçeke mestiimezin fi panzdehsalî ne!

Piştî van gotinên xwe mîna ku bi çavên xwe jî bibîne ka bi rastî jî ez keçeke mestiimezin im an ne, li min nêhirî ii heta serê guhên xwe sipfisor bii. Ez tişteki têgêhîştim. Ez li hem-

berî wî bêdeng rawestiya bûm fi bi çavekî mitfimat min H vn  
dinêrî. Ew hêdîka rabii fi bi şermokî ber bi min hat. Ji dUpekî  
nizanî bfi ku çi bikira. Di devê xwe de tiştina (Hgot. Mîna ku  
hîn nii têngêhîştî be ku ez keçikek mezin im ii bbcwaze ez H wî  
biborim. Di dawiya dawîn de ez têngêhîştîm. Ez nikanim rewşa  
56

xwe ya wê gavê bi lêv bikim, lê ez dizanim ku ez bi awakî mat-  
mayî, şermesar, fi ji Pokrovskî jî soromortir bfi, min bi de-  
stên xwe ruyê xwe veşart û ez ji odê beziyam der.

Min nizanî bii ku ez ê çi bikim, ji şermesariyê berê xwe bi-  
dime kuderê. Ca bifikirin, wî ez di oda xwe de girti biim! Sê  
rojan min nikanî bfi li ruyê wî binêriya. Ez sor dibiim ii çav H  
min tije hêsir dibiin. Ramanên gelek seyr fi xirab di serê min  
de diçûn fi dihatin. Ya herî diirî aqUan jî ev bû ku: min digot  
ez ê biçim bi wî re bipeyivim, hertiştî jê re bi awakî vekirî kat  
bikim fi jê re bibêjim ku ev tevgera min ne ji kêmaqiUya za-  
roktiya min bfiye, tenê ji dilê min î pak bfiye ku ez ketime oda  
we. U herweha min dbcwest ku ez li ser vê yekê wî serwext bi-  
kim. Min rasterast biryara xwe da ku ez êdî biçim, lê ji xêra  
Xwedê re newêrekiyê bi min girt û min ev yeka ha ne kir. Lê  
ku min bikira, kî dizane, dibe ku xirabtir û xirabtir bibûya.  
Nuha jî dema ku ev tiştên ha têne bîra min, ez ji ber şerm di-  
kim.

Piştî çend rojan diya min ji nişka ve bi nexweşiyê giran  
ket. Serê du rojan bfi ku ji nav nivînan ranebfi bfi, roja sisiyan  
agirê wê bilind bii û her pesta got. Wê şevê bêyî ku xew têke-  
ve çavê min, ez her li paş serê wê rûniştî mam, min av dayê fi

di wextên diyarkirî de min dermanên wê dayê. şeva duduyan hêle di min de ne ma bii. Serî gavê xeweke giran bi min digirt, çavên min dihatin girtin fi bi sergêjî dihênijîm. Ji westa bêxewiyê pir ne dima ku ez ji sandaliyê gêrî xwarê bibfiyama. Çer ku diya min hêdîka dinaliya, ez vediniciqîm, bi qasekî xew H min direviya, lê diire ez dîsa xewmilmajî dibfim. Ez gelekî narihet bfim. Ez nizanim ii nuha jî nayê bîra min bê çawa, lê di wê serê dema xew fi şiyariyê de min xewneke pn xirab dît. Ez bi tirs veniciqîm ser xwe fi hundurê odê tarî bfi. Finda şevê hindik ma bfi biqediya. Pêlên ronahiya wê ya dawîn carina di odê de biUnd dibû, carina weke siyekê U dîwêr cUxuya fi cari-

57

na jî bi tevayî wenda dibû. Tirseke mezin li min rabii. Di xeyalên xwe de ez hîna ji bandora wê xewna xwe ne fiUtî biim fi dUê min dihate guvaştin. Dema ku ez ji ser sandaliyê hoU ser xwe biim, ji ber wê tirs fi xofa giran min xwe ne girt û qêrînek bi min ket. Di wê gavê de derî vebii ii Pokrovskî kete oda me.

Ev tenê tê bîra min ku dema hiş hat serê min, ez di hemêza wî de bûm. Wî hêdîka ez H ser dîwançê dam riinişkandin, piyalek av ji min re hanî fi pirs li ser pirsê ji min kir. Nayê bîra min ku min çî bersiv dida wî. Lê wî bi destê min girt û do-

mand:

- Hiin jî nexweş in, hfin pir nexweş in. Agirê we bUmd biiye. Ku hiin li xwe mêze nekin, hiin ê xwe pir bêşînin. Bêhna xwe fere bikin fi hinekî rakevin! Piştî du saetan ez ê we şiyar bikim. Westa xwe bigirên...

Bêyî ku bihêle ez peyvikekî bibêjim, gotinên xwe dubare kir ii got:

- De rakevin, rakevin!

Ji westiyane hêle di min de ne ma bii ii çavên min xwe bi xwe dihatin girtin. Bi fikra ku ez bi qasî nîv saetekî tenê xewa xwe bigirêm, min xwe li ser dîwançê ramedand û heta sibê ez di xew de mam. Sibê heta beriya wexta dermanê rebena diya min jî Pokrovskî ez ji xew şiyar ne kirim.

Sibetira rojê min gelekî westa xwe girti bii. Êvarê bi biryara ku ez ê vê carê tew ranekevim ez li paş serê diya xwe rfiniştim. Saet di yanzdehê şevê de Pokrovskî li deriyê me xist. Ez çîim, min derî vekir ii wî got:

- Dibe ku ji rûniştina bi tenê, bêhna we teng bibe, loma min ji we re pirtûkek hanî, fermo hûn ê ji xwe re pê wexta xwe bibuhurîn.

Min pirtiik girt. Nayê bîra min ku çî pirtfik jî bfi. Li gel ku ez wê şevê heta sibê jî raneketim, lê Xwedê dizane min tenê

58

weha çavek li pirtfikê gerandi bfi. DUpekiyeke nependî girti bû ser dilê min, xew li min direvand û ez di cî de ne dihewandim. Çend caran ez rabûm ser xwe ii di odê de geriyam. Tevayîyê giyanê min bi kêfxweşiyekê hati bû dagirtin. Ji ber daniisitandina ku Pokrovskî bi min re dikir, dilê min gelekî şa bii bû. Ez pir serbilind biim ku wî fikra min dikir ii di ser min de hustuxwar dibû. Hetanî sibê her ez bi ramanên xeyalan bfim. Pokrovskî wê şevê êdî ne hat û ji xwe min jî dizanî bû. Lê ez baş pê ewle bûm ku ew ê şeva sibetirê bihata.

şeva sibe tirê, piştî ku herkes ketin nava nivînên xwe , Pokrovskî deriyê oda xwe vekir ii di devê derî de bi min re peyvî. Ji wan tiştên ku em bi hev re peyvîn, anuha peyvîkek jî nayê bîra min. Lê tiştê ku tê bîra min, matmayî ii şermokiya min bii. Ji ber vê yekê jî ez gelekî ji xwe hêrs dibfim ii bêtewat ez U bendî dawîya galegalên me biim. Ji ber ku min ji dil ev hevdîtina ha xwesti bii, tevayiyê rojê her min xeyalên wî kiri bfi û pirs ii bersivên xwe min ji berê de di serê xwe de çêkiri biin.

Hevaltiya nie ji wê şevê ii pêve dest pê kir. Di dema nexweşiya diya min de me her şev çend saetên xwe bi hev re dibuhurand. Piştî her hevdîtina me, ez ji rewşa xwe bextiyar dibiiim ii hêdî hêdî min şermokiya xwe ji ser xwe davêt. Ji bilî vê yekê jî bi dilşadiyeke nependî û payedariyeke serbiUnd min têderdixist ku Pokrovskî ji bo min pirtfikên xwe yên bêyom ji bîra kir. Rojekê bi ken ii gotin mijara peyvê hat li ser wan pirtiikên ku ji refikê gêrbfiyî sekinî. Rewşeke seyr bfi. Ez jî bi her awayî ji dilekî pak fi bi şorgermiya naşiyekê pejdvîm. Pêjnên seyr fi dUpekiyekê bi min girt û min hertişt jê re kat kir ku: min dixwest ez bixwînim ii bizanim, lewra ez pir pê dêşim ku herkes min hîna wek keçîkek piçfik fi zarokê cUbîne. Ez dubare dikim. Ez di rewşeke pir germ de bfirm. Dilovaniyê girti bfi ser min fi çavên min tije hêsir bfi bûn. Bêyî ku

59

tiştêkî jê veşêrim, min hertişt ji wî re got. Daxwaza hevaltiyê, hezkirina ji wî, xweşkirina dUê wî, daxwaza jiyîna bi wî re, bi kurtî yek bi yek min hemû jî jê re vekirî got. Pokrovskî bi

ruyekî şermok û mitiimatî li min dinêrê, lê deng ne fikir. Di wê gavê de ez ewqas êşiyam û ewqas xemgîn ketim ku min di dilê xwe de digot: wî ez fam ne kirim an jî tinazên xwe bi min dike.

Min xwe ne girt, ji nişka ve girîyekî bi min girt û wek zarokekê ez bi hîskehîsk girîyam. Mîna ku krîzekê bi min girti bfi. Pokrovskî bi destên min girt fi maç kirin, dan ser singê xwe ii pê ve şidandin, û ji hêlekê ve jî bi peyvikên xweşik dUê min xweş fikir. Pir diltenikî bfi bfi. Nayê bîra min ku vn çi digot. Lê tenê ez digirîyam, dikeniyam, diire digirîyam ii dîsa dikeniyam. Ez soromor dibiim û ji kêfxweşiyê min nikanî bfi tiştê bigota. Lê li gel wê hemfi dilpekiya xwe jî, min têderdbdst ku Pokrovskî xwe diguvişîne ii di rewşeke teng ii tevUhev de ye. Xwedê dizane ji ber wê kewkeliya dilpekiya min, ji ber hevaltiya min ya germ fi vmsa ji nişka ve, wî tiştê ji hev dernedixist. Dibe ku wî ji destpêkê de ji ber pêjnên mereqdarîyê nêzîkî li min fikir. Lê dfire ev dudiliya wî lê wenda bû, dilpakî, xweşgotinî fi nêzîkayiya min ji dil pejirand. Wek birayekî helal û hevaleyê dilsoz daxwazên pêjnên min bi cî hanîn. DUê min ewqas xweş û ez ewqas dilgermî bfin ku!... Pokrovskî didît ku ez tiştê jê venaşêrim, loma jî her roj xwe bêtir nêzîkî min digirt.

Li ber pirpitîna ronahiya finda li paş serê rebena diya min ya nexweş, ew hemû tiştên ku em di hevdîtinên xwe yên xweş ii bê êş de dipeyivîn, bi rastî jî nayên bîra min. Hemii tiştên ku dihatin hişê me, tiştên ku li dilê me radibfin û tiştên ku dihatin ser zimanê me, me ji hev re digot. Em wê çaxê bextiyar bfin. Ax, çi demeke xemgîn ii kê6cweşîn bfi! Ez anuha jî wan

deman him bi dilxweşî fi him jî bi xemgînî bi bîr tînim. Çi bî-  
60

ranînên xweş fi çi yên xembar, bîranîn hertim merivan xem-  
bar

dikin. An jî bi

kêmanî ji bo

min weha ye.

Lê di vê

xemxwariyê de ciyê kêfxweşiyê jî heye. Dilekî teng ii bi kovan  
dikane bi bîranînan jîndar bibe. Herwekî kulîlkek ku di binê  
kelkela germa nava royê de biçilmise, bişewute fi diire bi avî  
û hênikayiya serê êvarê re U xwe vegere.

Diya min baş bii bii, lê ez hîn jî bi şev li paş serê wê rfidi-  
niştim. Ew pirtikên ku Pokrovskî dida min, di destpêkê de ji  
bo ku ez xewê li xwe birevînim, min ew dixwendin. Lê dûre  
bala min kişandin ii min ew bi baldarî xwendin. Ê ji nişka ve  
dunyayeke nû ii heta wê çaxê ji min ve nexuya, li ber min ve-  
bû. Ramanên nii, pêjnên nû girtin ser giyanê min. Li hemberî  
van tiştên nfi, her ku çii dilpekî li min zêdetir bfi, riimeta wan  
bi min girantir hat fi min bi kêfxweşî xwe da ser wan. Di vê at-  
mosfera nii de ev hemû tiştên ha li min bfi ba ii bahoz ii di ru-  
hê

min

de

pêl

dan.

Lê ji



xêra

ku

ez di bûyîna

xwe

de

xeyalperest biim, min xwe li ber vê bahoza ruhî girt û ez ne fetisîm.

Piştî ku nexweşiya diya min derbas bii, hevdîtinên me yên şevê û galegalên me yên diirûdirêj jî hatin birîn. Carina wek rasthatinekê ku em pêrgî hev bihatana, ji vir ii wir me çend peyvên vala ji hev re dikir. Lê dîsa jî min li gor xwe maneyên mezin dida wan, ew bi rfimetên taybetî şirove dikir ii ez pê kêfxweş dibiim. Dilê min şa bfi. Ez bextiyar bûm ii min ji bextiyariyeke kêfxweşîn ii bêdeng ditamijî. Çend hefte bi vî awayî buhurîn.

Rojekê Pokrovskiyê pîremêr hate mala me. Dfirfidirêj bi me re peyivî, ji berê kêfxweştir, şorgermtir û gelekî li ser xwe bfi. Henekên bi awayê xwe dikir, her dikeniya, di dawiya dawîn de sedema dilxweşiya wî hat famkirin. Bi me da zanîn ku hefta were vê rojê, zayeroja Petenkayê wî ye, ji ber vê yekê jî ew ê wê rojê ji sedî sed were serlêdana lawê xwe, ew ê êlegê

61

xwe yê nû li xwe bike û jina wî jî soza kirîna cotek potînên nû daye wî. Bi kurtî pîremêr pir ii pir bextiyar bii, heta ku jê dihat zimandirêjî dikir fi her dipeyivî.

Zayeroja wî! Vê ramanê, ne bi ro ii ne jî bi şev rihetî da min. Ji bo ku ez hevaltiya xwe bînim bîra wî, fikirîm ku ez jê

re xelatekî bikirim. Lê çi?... Diire min biryara xwe U ser kirî-  
na pirtfikekê da. Weke xelat min ê ji çapa dawîn hemû dîwanên  
Pîşkî pêşkêşî wî bikira, lewra min dizanî bfi ku wî ji dU  
hemû dîwanên Pûşkî divêt. Bi qasî sî riibleyê min î arizî he-  
bfi. Min ew ji karê dirûnê dabiin ser hev ku ji xwe re pê kin-  
cên nii bikirim. Min rabii aşpêja me ya pîr Matryona şand ku  
binêre ka buhayê tevayîyên dîwanên Pûşkî bi çiqasî ye.  
Xwedêyo! Yanzdeh dîwan tev buhayê bergek hişk bi kêmanî  
şêst riibil digirt. Min ê evqas pere ji kuderê peyda bikira?  
Min da ber hev ii da ser hev, lê min nizanî bii ku ez ê çawa ji  
nav derkevim. Min ne dbcwest ez ji diya xwe bbcwazim. Ya  
rastî diya min ê bêguman alîkariya min bikira, lê wê çaxê jî  
herkes ê bi vê xelatê bihesiya. Ev pirtiikên ha jî, herweha ew  
ê ji xelatiyê de biketa ii bibiia wek deynekî, deynê dersên ku  
Pokrovskî salekê dabû. Lê min dbcwest bêyî ku kesek pê bi-  
hese, weke xelat ez tişteki bidime wî. Ji bo dersdayîna wî jî  
min dil hebû ku ez heta mirinê sipasdarê wî bimînim fi dosta-  
niya xwe pêşkêşî wî bikim.

Di dawîya dawîn de ji vê dijiwariya rewşa xwe re min rêyek  
dît. Min dizanî bii ku li Gostini Dvorê(\*) pirtûkên piçekî  
kevn, piştî hişkebazarekê meriv ê bikani be bi nîvbuhayî biki-  
re. Min biryara xwe da ku ez bi demkî zfitir xwe bigêhînim  
wir ii sibetirê jî ev fesala kete destê min. Ji bo Anna Fedorov-  
nayê ii mala me kirîna tiştan pêwîst kir. Diya min nesax bfi,  
Anna Fedorovnayê bi xwe re ne didît ii herweha ev karê ha  
(\*)Gostîndvor:L/ Petersburgê firoşgeha herî mezin e. WW  
62

ma li ser min. Min jê Matryona girt û em bi hev re çiin.  
Karê min li hev hat. Bi bergek hişk ii gelek xweşik, min ta-  
vilê tevayiya dîwanên Pfişkîn dît ii min dest bi bazariyê kir.  
Pêşiyê mêrik pereyekî wusa xwest ku ji buhayê ba pirtîikfiro-  
şan jê zêdetir. Lê piştî bazariyeke diîrûdirêj, çend caran jê min  
wusa da xuyakirin ku ez ê nekirim ii biçim, mêrik nerm bfi fi  
buhayê tevayiya dîwanan ji min re daxist sê ii pênc rhibilan. Ji  
vê bazariya xweş çiqas kêfa min hati bii! Lê Matryona rebcn  
tênedigêhîşt ku ev kêfxweşiya min ji ber çî ye, fi çima ez ew-  
qas pir pirtfikan dikirim, her bi mitiimatî dinêrî. Mbcabin, te-  
vayiya perê min sê rhibil bii û xwediyê pirtîikan zêdetir jê ji  
buhayê xwe danediket. Ez li ber geriyam, min xwe havêt bex-  
tê wê ii di dawiya dawîn de du rûbil fi nîvê din jê daxist. Diire  
sond xwar ku wê ev yeka jê nemaze ji bo xatirê xweşikiya min  
kiriye ii wê ê li darê dunyayê ji kesekî din re ewqas danexista.  
Lê mbcabin hîn jê perê min du riibil ii nîv kê m bfin. Ji kerbana  
pir ne ma bii ku ez bigirîyama. Lê rewşeke napayî xwe gîhand  
hewara min ii ez ji vê tengasiyê filitandim.

Ji me hinekî dfer, U ber pêşangeheke din Pokrovskiyê pîr  
sekinî bû. Çend pirtûkfiroşan dor li wê girti biin, dbcwestin wê  
birûçikînin fi serî lê gêj kiri biin. Herkesî tiştên xwe dirêjî wê  
dikir ii dbcwestin tiştên xwe bifiroşine wê. Ev rebena jê di nav  
lepên ewqas pirtfikfiroşan de gêjikî bii bû. Ji wan tiştên ku  
pêşkêş dibfin, wê nizanî bfi ku ew ê kîjanê bikire. Ez çiiim ba  
wê fi min jê pirsî ka ew çî dike. Dilê pîremêr pir şa bfi ku rastî  
min hat. Gelekî ji min hez dikir ii dibe ku bi qasî Petenkayê  
xwe.

Bersiv da ii got:

- Min dil heye ku ez pirtiikan bikirim, Varvara Alekseyev-na, ez dikim ji bo Petenkayê xwe çend pirtfikan bikirim. Roja bfiyîna wî nêzîk e. Ewqas ji pirtûkan hez dike ku, ku ez jê re çend pirtiikan nekirim, nabe.

63

Pîremêr hertim tewşomewş dipeyvî, lê nemaze vê carê yekcar tevlihevî bû bii fi nizanî bii çi bikira. Dest davête kîjan tiştî, ji du sê riibilan kêmtir nibiin û ev buhayên ha jî ji bo wî giran biin. Wî tew pirsas buhayên pirtiikên sitiir ne dikir. Bi dilbijokî li pirtiikan dinêrî, digirt destê xwe, di destê xwe de dibir ii dihanî, riipelên wan di ser hev de diquliband, dîsa dadihanî dewsa wan fi pê dilê xwe xweş dikir. Ê diire di ber xwe de hêdîka:

- Na, na... buha ne. Dibe ku U vir tiştêk peyda bibe... digot fi diçii di nav pirtiikokên tenik, zirav; pirtûkên sitran û salnamên bêrîkan de digeriya. Bi rastî jî ev tiştên ha gelek erzan biin.

Min jê re:

- Baş e, tu çima dbcwazî van tiştên vikfivala bikirî? got û pê bala wî kişand.

Wî bersivand ii got:

- Na, na... ca lê binêrin bê li vir çi pirtfikên xweş hene! Bi rastî jî pirtiikên baş in!

Ev peyvikên xwe yên dawîn ji dilekî wusa şewutî got fi dirêj kir ku pir ne ma bû ji kerba buhayiya pirtfikên hêja bigirîya fi mîna ku ez bibînim dilopên hêsrên wî ji gupên wî yên vemirî de gêrî ser pozê wî yê sor dibin. Min pirsî ka wî çiqas pere

hene.

Pîremêr ji nav kaxizeke rojnamê fi qirêjê perên xwe derxistin fi got:

- Ev yên ha ne, nîv rûbilekî zîvîn, bîst kopêkên zî\an fi bîst kopckên sifirîn...

Min rabii ew bir ba pirtfikfiroşê xwe û gotê:

- Binêrin, buhayê van hemii yanzdeh pirtfikên ha bi sî fi du riibil û nîvan e. Sî rûbilên min hene, ku hûn jî yê majî bidin, wê çaxc em ê van hemfi pirtiikan bikirin fi bi hev re diyariyê wî bikin.

64

Ji kêfxweşiyê pir ne ma bfi ku pîremêr dîn bibiia. Hemû perên xwe derxistin rastê fi pirtiikfiroş tevayiyê pirtûkxana xwe bi dest min fi wî ve berda. Pîremêr pirtiik kurisandin bê-rîkên xwe, xistin binçengên xwe, çend lib jî girtin destê xwe fi berê xwe da malê. Soz da min ku ew ê sibetirê hemii pirtfikan bi dizîji min re bîne.

Sibetirê pîremêr hat ba lawê xwe, weke hertim bi qasî saetekê rfinişt ii diire jî hat mala me. Bi awakî komîk fi rewşeke dizî li kêleka min riinişt. Bi serbilindiya xwecUyê wersirekê pişirî, destên xwe di hev re dan, bêyî ku kesekî pê bihesîne bi min da zanîn ku wî pirtiik hanîne û anuha di bin çavdêriya Matryonayê de, li hêla aşxanê li ciyekî sv/l& veşartî ne. Dûre jî peyv xwe bi xwe vegeriya hat ser zayeroja ku dihat payîn. Li ser rewşa ku em ê bi çi awayî diyariya xwe pêşkêş bikin, pîremêr dfirfidirêj peyivî. Her ku ew dipeyî\ a ii xwe pê ve berdi-da, min têderdbdst ku tişteki di dUê wî de heye fi nikane, an jî

newêre bibêje. Ez her bêdeng bûm û min dipa. Ew xwiyên wî  
yên ku heta nuha ne dihat famkirinê, livên dêma wî,

ew

kêfxweşî fi bextiyariya ku bi çavşikandina çavê xwe î çepê U  
xwe dida xuyakirinê, hêdî hêdî lê wenda biin. Her ku çii ren-  
gê xemgînî ii şikebaryê lê diyar bii. Di dawiya dawan de xwe  
ne girt, bi awakî tirsonek û şermokî di ber xwe de hêdîka:

- Ewk e... binêrin min ê ji we re tişteke bigota, Varvara  
Aleksyeyevna, got û bi dilpekînî domand: Ez dibêjim di zaye-  
roja Petenka de deh pirtfikan hûn bi destê xwe bidin wî fi pir-  
tfika mayî jî ez bidime wî. Herweha mîna ku me heryekî  
diyariya xwe pêşkêşî wî kiri be.

Piştî van gotinên xwe pîremêr bi rewşeke tevlihev dengê  
xwe birî û bi awakî şermokî li bendî bersiva min bii.

- Baş e, hfin çima naxwazui em bi hev re van hemfi pirtfi-  
kan bidine wî, Zaxar Petrovîç.

- Ji ber ku... Varvara Aleksyeyevna, hûn cUzanin ku ez

65

ewk...

Pîremêrê reben soromoro bfi, ziman lê negeriya ii nizanî  
bii ku wî ê çî bigota. Lê diire ber bi hev hanî û got:

- Varvara Aleksyeyevna, hiin dizanin ku ez... kêmasiyeye  
min heye. Carina, ez dikanim bibêjun pirî caran... ya rastî ez  
hertim henekan dikim. Carina dunya gelekî sar dibe, carina  
dilê min ji tişteke teng dibe, an jî ji ber tişteke xemgîn dibim,  
wê çaxê ez xwe nikanim bigirêm fi heta ku ji min tê, ez vedix-  
wim. Ev yeka jî dUê Petriişka teng dike, ji vî xwiyê min neri-

het dibe, li min hêrs dibe, kirinên min dide ber pozê min ii şîretan li min dike, Varvara Alekseyevna. Loma ez jî anuha dbcwazim bi vê diyariya xwe bi wî bidime zanîn ku hişê min hatiye serê min, min xwe serast kiriye û tew bi qasî kirîna pirtiikekê min pere jî dane ser hev. Lewra ji bilî van çend qurişên ku carina Petrûşka dide min, mm pere nîne. Ew jî bi viya dizane. Ji ber vê yekê jî ew ê têbigêhîje ez êdî perê xwe li avare bi kar naynim ii ew ê bibîne ku min ev yeka ha ji bo xatirê wî kiriye.

Dilê min pir bi pîremêr şewutî. Pêwîst ne dikir ku ez zêdetir li ser bifikirim. Pîremêr bi şikebarî U min dinêrî.

- Binêrin, Zaxar Petroviç, min gotê, wan hemiiyan jî hfin ê bi xwe bidine wî.

- Çawa hemiiyan! Ango hemû pirtiikan?

- Belê, hemfi pirtûkan.

- Ji aliyê xwe ve?

- Ji aliyê xwe ve.

- Ji aliyê xwe ve tenê, ango li ser navê xwe?

- Belê, li ser navê xwe.

Ez dibêm qeyê ez bi awakî pir vekirî dipeyivom. Lê heta demeke dirêj jî pîremêr têngêhîşt. Pêşiyê hinekî fikirî ii dûre

- Bi rastî jî ew ê gelekî baş bibe. Lê hûn, hfin e çi peşkeşi

66

wî bikin, Varvara Alekseyevna?

- Ez qet tişteki jî pêşkêşî wî nakim.

Mîna ku tirsek têkeve dUê pîremêr fi:

- Çi? Hfin tişteki pêşkêşî Petenka nakin? Ma hûn naxwa-

zin tişteki bidin wî?

Rasterast tirsek keti bfi dUê pîremêr. Wusa xuya bfi ji bo ku ez jî diyariyekê ji lawê wî re bikirim, di wê gavê de dikanî bû dev ji wê pêşniyara xwe ya pêşîn jî berdana. Pîremêr xwe-diyê dUekî pak bû. Min xwest ez wî serwext bikim û min pê da zanîn ku bi rastî jî ez dixwazim cUyariyekê bidûne kurê wî, lê ez naxwazim ew bi xwe jî ji vê kêfxweşiyê bêpar bimîne.

Diire min lê zêde kir fi got:

- Ku dilê lawê we xweş bibe, hûn ê jî bextiyar bibin ii ez ê jî... Lewra wê çaxê mîna ku min jî diyariyek dabe wî, ez ê cU dilê xwe de kêfxweş bibim.

Ji ber van gotinên min, pîremêr serwext ii bêhnfere bfi bû.

Bi qasî du saetên din jî U ba me ma, lê di ciyê xwe de ne dihe-wiya, kêf lê bii bfi kêfa gur fi radibfi bi gavên dengdar di odê de digeriya, bi şaşayê re henek dikir, bê>î ku kesekî pê bihe-sîne carina ez maç dikirim, di piyê min de diqurincand û de-ma ku paşê Anna Fedorovnayê diketê, viya dev ii pozê xwe jê re xwar dikir. Lê di dawiya dawî de Anna Fedorovnayê rabû ew der kir û çii. Bi kurtî, di jiyana xwe de Xwedê dizane ev cara pêşîn bii ku pîremêr ji kêfxweşiyê nizanî bfi çi dikir.

Di wê zayeroja lawê xwe de piştî ku pîremêr ji dêrê der- ket, saet di yenzdehan de hat mala me. Bi frakekî li gor nav- piyê vn çêkirî ii bi rastî jî bi êleg û cotek potînên nû bii. Di herdu destên v/î de jî pirtiikên pakêtkirî hebiin. Ji ber ku roja yekşeynîyê bii, em hemû li eywana mala Aima Fedorovnayê civiya bûn û me kahwe vedixwar. Ez bawer im pîremêr bi pe- sindayîna helbestvaniya Piişkîn dest bi galegalê kir. Lê dfire ji nişka ve xwe tevHhevî kir fi kete nav mijareke din. Her çêU



cnxweşiya merivan fikir fi dida zanîn ku ji bo meriv xwiyekî baş divêt, ku meriv ji xwiyekî baş bêpar be, wê çaxê meriv ê henek û qeşmeriyan bike fi pê têkeve rewşên xirab. Piştî ku pîremêr çend nimfinên rewşên xirab jî vekir, dûre da zanîn ku ev demek e wî dev ji xwiyên xwe yên xirab berdaye fi xwe daye ser xwiyên nimûne<sup>n</sup>. Ew şîretên ku lawê vn lê kirine, wî di serê xwe de bi cî kirme ii pîvana tevgerên xwe H gor wan datîne. Ji bo nimfina rastiya van gotinên xwe jî, dida zanîn ku ev ji zû de ye wî pere berhev kirine fi wek diyarî wî ji kurê xwe re pê ev pirtûkên ha kirîne.

Dema min guhdariya gotinên pîremêrê reben dUcn, ken û girî tev bi min digirt. Baş xuya dikn ku H wî teng bihata, vn di-kanî bû wek pisporekî derew U hev siwar bUcira. Pirtiik g%tin oda Pokrovskî fi di refikê de bi ci biin. Lê Pokrovskîyê ciwan tavilê rastiya vê yekê tégêhîşt. Wî pîremêr banî xwarinê kir. Wê rojê kêfa me hemfiyan U cî bii. Piştî xwarinê em lîstikên salonê û qeremaçan lîstin. Nerindiya şaşayê dîsa pê girti bii. Ez bi xwe jî ji wê ne kêmtir bûm. Bala Pokrovskî her li ser min bii fi çavên xwe digerland fi keysek cUpa ku bi min re bi-peyive. Lê min ev keys ne da wî fi her min xwe jê diir vekişand. Di van çar salên dawîn de xweştu-în roja min ev roja ha bû.

Lê ji vir ii weha bîranînên min her bi xem fi kovan e. Anu-ha ez ê çîroka rojên xwe yên reş û tarî kat bikim. Dibe ku ji ber vê sedemê ye pênûsa min giran dibe ii nola ku naxwaze binivise. Ê dibe ku ji ber vê yekê be ez wusa bi rUietî jiyana

xwe ya wan rojên bextiyar ji ser ii ber ve bi bîr tînim. Lê mixabin, ev rojên ha pir najotin! Xemgîniya rojên reş ii tarî dewsa wan girt fi Xwedê dizane bê kengê dawiya wan tê.

Xemgîniya min bi nexweşî ii mirina Pokrovskî dest pê kir.

Bi du mehan piştî vê bûyera ku min kat kir, ew nexweş ket.

Di van du mehan de ji bo debara jiyana xwe her H pey karekî

68

dibeziya. Wek hemfi kesên ku bi jana ziravê dikevin, wî jî he-ta gava xwe ya dawîn hêviya xwe ji jiyaneke dirêjtir ne birî bii.

Ji bo mamostetiyê carekê U ciyekî banî kirin, lê dilê wî ji vî karê mamostetiyê li hev diket ii ne xwest. Ji ber nexweşiya xwe nikanî bii wek karmendekî têteta karekî fermayî jî. Ji bilî vê yekê, ji bo girtina mafekî mehanê jî dîsa diviya bfi gelekî bipa. Bi kurtî Pokrovskî destê xwe dirêjî çî fikir, bi dest ve ne dihat. Bêhna wî teng dibii. Bêyî ku wî hay jê hebe nexweşiya wî lê azirî. Herweha payîz hat. Her roj bi bertena paltoyekî tenik derdiket, li ser karê xwe digeriya ii bi bergerîn derî bi derî dibeziya ku ji xwe re ciyekî peyda bike. Ev tişt ji bo vn mirin bû. Di şilî ii şepeliyê de Ungên wî şU dibfin û serma lê diket. Dûre kete cilê ii êdî ji nava nivînan ranebfi. Di rojên dawiya payîza navîn de jî mir.

Di dema nexweşiya wî de her ez di oda wî de bfim, min karê wî fikir fi lê dinêrî. Gelek şevan ez bêxew mam. Kêm caran hişê wî dihat serê wî ii pirî caran pesta digot. Çi ne digot ku! Çêlî karê ku wa ê peyda bikira, çêlî bavê xwe ii çêlî min fikir. Gelek tiştên wî yên ku min berê pê nizanî bii ii haya min jê tune bû, bi vî awayî ez hîn bfim. Di destpêka demên

nexweşiya wî de, di xênî de bi awurên bêmane li min dinêrîn. Anna Fedorovnayê hertim serê xwe li ba dikir. Lê min rasterast li nav çavên wan mêze dikir. Piştî ku dîtî ez bi dostaniyê ke çawa nêzîkî Pokrovskî dibim, wan jî êdî bi çavekî din li min ne dinêrîn. Bi kêmanî diya min di vî warî de serwext bii bû.

Carina hişê Pokrovskî dihat serê wî fi wî ez nas dikirim. Lê ev pir kêr daran dibii. Ji xwe pirî daran ew her bêhiş bii. Hinek şevan bi pesta tiştên tevlihevî digot û ne dihatin famkirinê. Dengê wî ê nîvxeniqî di oda teng de mîna ku ji hundurê tabûtekê were, olan dida. Di şevên weha de tirs dikete dilê min jî. Nemaze di şeva dawîn de ew bfi wek merivekî har. Di 69

nava êş fi azareke giran de diqepijî fi dipnîtî. Nalîna vn agn bi kezeba min dbdst. Di xênî de tirseke gnan girti bû ser hemfi kesan. Anna Fedorovnayê banî Xwedê dikir ku nexweş bi gavekî zûtir bimire. Şandi biin pey doktorekî lê doktor di carekê de da zanîn ku nexweş ê negêhîje sibê ii ew ê bimire. Pokrovskiyê pîremêr, ew şeva U korîdorê U ber deriyê oda lawê xwe buhurand. Ji bo riiniştinê jê re U wir hesîreke piçîik raxisti bfin. Keti bfi rewşeke xirab û serî gavê diket hundurê odc. Ji berketinê ewqas heUsî bû, mîna ku hişê xwe wenda kiri be gêjikî bii bfi. Ji tirsana serê wî dUieziya, tevayiya laşê wî dilerizî, her dikire pilepil fi xwe bi xwe dipeyi\ a. Mm digot ew ê nuha ji diltengiyê dîn bibe.

Bi destê sibê re pîremêr ji xemgîniyê bêhal ket ii li ser hesîre kete xeweke giran. Kurê wî ber bi saeta heştê sibê kete

ber mirinê fi loma min bavê wî şiyar kir. Hişê lawik H serê wî bii fi ji me hemiiyan jî xatir xwest. Tişteki seyr! Girî ji min ne dihat, lê dilê min teng û ruhê min diguvişî.

Deqeyên wî yê dawîn ji bo min girantir ii dilşewatir hatin. Bi zimanê xwe î giranbiiyî bi dijwarî her fi her tiştma dixwest, an jî dipirsî. Lê ne gengaz bii ku meriv tişteki ji peyvikên wî têbigêhîşt. Agir bi kezeba min diket! Heta saetekê jî her bêhaviil ii bi qirqilîn destên xwe yê sarbiiyî dilivand û dbcwest daxwaza xwe bi lêv bike. Diire bi wî dengê xwe yê nîvçe û fetisokî dîsa lava fikir, lê peyvikên ku ji devê wî derdiketin, min ji hev dervedbdst. Min yek bi yek kesên malê banî cem wî fikir, min av dida wî, lê wî her bi xemgînî serê xwe dihejand. Di dawiya dawîn de ez têngêhîştim ku wî çî divê. Dbcwest ku em perdê rakin, berbavên pencerê vekin. Ez wer bawer im ku dixwest cara dawîn hêşînayiya erdê Xwedê, ronahî ii royê bibîne. Min perda pencerê rakir, lê destpêka rojê jî wek jiyana wî ya anuha xemgîn ii reben bii. Berê asimanan bi ewrekî reş hati bii girtin ii ro xuya ne fikir. Rojeke bi mij, şûek û

70

bêhtengîn bfi. Baraneke hûr hêdî hêdî li camên pencerê dixist, wek xêzikên sar fi qirêj pê de dadiwerivî xwarê. Li aliyê derve rojeke rengvemirî ii bêhtengîn hebii. Mîna ku ronahiya roya nii jî bi dijwarî xwe bigêhîne hêla hundur fi tevlihe\ronahiya finda pêş wênexaçê bibe. Pokrovskîyê li ber mirinê bi xemgînî li min mêze kir fi serê xwe hejand. Piştî gavekê jî mir.

Anna Fedorovna bi xwe mijfilî kariibarê hilanîna mirî bfi.

Tabûteke sade hate kirîn ii duruşkeyek hate kirêkirin. Ji bo kirina mesrefên xwe, dest danîn ser hemii pirtfik û tiştên Pokrovskiyê rihmetî. Bavê wî yê pîremêr bi Anna Fedorovnayê re pevçinî, di ser de got fi bi qasî ku ji destê wî hat, piraniya pirtfikan bi şfin de girt, kum ii bêrîkên xwe ji wan dagirt ii heta sê rojan(\*) her ew bi xwe re digerlandin. Dema diçû dêrê jî destê wî ji wan ne dibfi ku ew ji xwe veqetanda. Di van sê rojan de mîna ku bi kêrî tiştêkî were, wekî sergêjekî her li dor tabiitê diçfi fi dihat. Gulçelengên U wir rast dikir, findina vêdixist an jî yên nii dadihanî. Ji rewşa wî jî baş xuya dikir ku bi ramanên vikiivala bii. Ji bo seremoniya cenazê ne diya min û ne jî Anna Fedorovna hatin dêrê. Diya min nexweş bfi, li gel ku Anna Fedorovnayê ji bo çûyîna dêrê xwe tev jî kiri bii, lê ji ber pevçîina wê ii Pokrovskiyê pîremêr, ew jî li malê ma ii ne hat. Ez ii pîremêr tenê bfin. Di xwendina ayînê de tirs û xofeke nepayî girte ser min û ez bi dijwarî li ser lingan disekinîm. Dûre derê tabfitê girtin, bizmar lê xistin, li duruşkê kirin fi birin. Tenê heta serê kuçê ez pê re rast biim. Duruşkevan hesp rakirin çargaviyan. Pîremêr li pey dibeziya û bi dengê bilind digirîya, lê ji bazdanê dengê giriyê wî dilerizî ii dihat birîn. Di wê navberê de kumê rebeno ji serê wî ket, lê ji bo girtinê tew ne sekinîjî. Ji baranê serê \w şil, bfi bfi wek avê. (\*) Di ola xinstiyaniyê de, miiî di roja sisiyan de tê hilanîn. WW  
71

Bayekî sar rabû, baranê zivirand pfikeke wusa ku serçavên merivan perîncok dikir. Wusa xuya bû vê şîU fi şepeHyê xwe li pîremêr ne dida der. Bi girî fi hîskîk ji hêleke duruşkê

dibeziya hêla din fi dbcwest xwe pê re bigêhîne. Dawên re-  
dîngotê wî yê tenik î dirêj ji bajî weke perazîngan H ba dike-  
tin. Ji hemfi bêrîkên wî pirtfik dipengizîn. Bi herdu destên  
xwe pirtîkek sitiir hişkîrî dabû ber hemêza xwe. Kesên ku di  
rê de derbas dibfin, kumên xwe ji serê xwe dikirin ii guneh di-  
weşandin. Hinek U paş xwe dizivirîn fi bi matmayîn U pîremê-  
rê reben dinêrîn. Serî gavê pirtîk ji bêrîkên wî diketin nav  
celbê. Dema ku yekî ew dida sekinandin fi ew ji pirtîkên xistî  
haydar dikir, xwar dibii ew ji erdê digirtin fi dîsa U pey tabûtê  
dibeziya. Li serê kuçê pîrejineke parsek jî bi wî re da pey ta-  
biitê. Piştî ku duruşke ji serê kuçê fitilî, êdî ji ber çavên min  
wenda biin. Ez vejeriyam malê, bi xemgîniyeke bêpîvan min  
xwe havête hemêza diya xwe, bi giriyekî jidil her min ew maç  
kir û heta ku di min de hebii min ew wusa bi sîngê xwe ve diş-  
idand mîna ku ez bixwazim vê hogira xwe ya dawîn, hezkiriya  
ber dilê xwe ji nav lepên mirinê bifilitînim... Lê mbcabin, mi-  
rin heta paş serê diya min hati bû jî...

Ilê Havîna pêşîn

Ji bo seyrangera me ya do êvarê li giravê, ez pir û pir si-  
pasdarî we me, Makar Alekseyevîç! Çiqas xweş, hênik fi çi  
hêşînayî bfi! Ji kengî ve ye ku min hêşînayî ne dîtiye. Dema ez  
nexweş bfim, her ez li ser mirina xwe difikirîm ii min digot,  
bcguman ez ê bimirim. Hêvîdar im hûn tégêh^tin bê ez bi çi  
pêjn ii di çi rewşê de bfim. DUê xwe ji min nekin ku ez do hi-  
nekî xemgîn bûm. Ya rastî ez pir kêfxweş ii gelekî bextiyar

72

bûm, lê di demên weha de hertim xemgîniyek dadikeve ser

min. Ez girîyam lê ne girîng e, ez bi xwe jî têngêhîjim bê ez çima hertim digirîm. Pêjnên dUê min pir tenik in, bergehên ku li hawurdor ber bi çavên min dikevin, dUê min teng dikan. Ew asimanê sayî û gwînvemirî, avaçîna royê û bêdengiya serê êvarê hemfi jî xweş bûn, lê ez nizanim çima bê do êvarê dilê min teng ku". Kelagirî li gewriya min piçUcî, mm nikanî bfi pêşî li hêsrên xwe bigirta ii ez girîyam. Nizanim bê çima ez van tiştan ji we re dinivînim? Ev tiştên ha bi meriv bi xwe jî dijwar tî, ji hinekên din re katkîrin dijwartir e. Lê Xwedê dizane, yê ku min fam bike dîsa hfin in! Bi rastîjî ji hêlekê ve ken û ji hêlekê ve jî giriyê min tî. Hûn çî merivekî baş in, Makar Alekseyevîç! We do wusa li hundurê çavên nun dinêrî, mîna ku we pêjnên kêfxweşiya min di çavên min de didît û hfin pê bextiyar dibiin! Dema ku çavên min H deviyekî, li xaçerêyekê an jî li kortikekê asê dibfi, mîna ku hûn min U wargeha xwe bigerînin, li pêş min hûn jî li wir rawestiya biin û we U nava çavên min dinêrî. Ev hemû tiştên ha baş dide xuyakîrin ku hfin çî merivekî dUpak in, Makar Alekseyevîç. Ê loma ez ji we hez cUkim. De bi xatirê we! Ez îro jî nexweş un. Do lingên min şil bû bfin, min serma girtiye. Fedora jî hinekî nexas e, em herdu jî nerihet in. Min ji bîr nekin, pu-tir werin serlêdana min.

V.D'ya we.

12ê Havîna Pêşîn

Kevoka min, Varvara Alekseyevna!

Min jî digot qeyê hûn ê gera me ya do, weke helbestekê U pey hev rêz bikin. Lê ez dinêrim ku vye hemû U ser rûpeleke

73

kaxeza namê bi cî kiriye. Lê dîsa jî divê ez bibêjim ku U gel vê kurtbûnê jî gelek baş ii xweşik hatiye nivisîn. Natur ii bergehên wê, gelek tiştên din ii pêjnên xwe, we hemii jî pir xweş nîgariye. Ya rastî ev zîrekiya di min de tune. Ku ez deh rîpelan jî reş bikim, dîsa jî ez ê ewqasî bi ser nekevim. Lewra min xwe ceribandiye. Hfin dinivisînin û U ser min dibêjin ku ez merivekî baş, dilpak, dilovan, ji xirabiyên dîr ii ez têgehîştîyê nexşîniya natura Xwedê me. Bi kurtebirî hfin gelekî pesnê min didin. Ev hemû tiştên ku we nivisandiye rast in, dayika min. Wek ku hiin jî dinîgarînin, ez yekî wusa me fi ez bi xwe jî viya dizanim. Lê dîsa jî dema meriv nameyek weke nama we dixwîne, bêyî daxwaza xwe dilê meriv tenik dibe ii ramanên giran li serê meriv dicivin. Lê hfin guhdar bikin, ez ê anuha ji we re çî kat bikim, dayika min.

Ez ê ji serê de dest pê bikim. Wexta ku min nû dest bi vatîniya xwe kir, ez rasterast huvdesalî biim, û anuha ev nêzîkî sîsalî ye ku wext di ser re buhurîye. Ya rastî, gelek unîformên fermayî li navpiyê min kevn bûn. Ez gêhîştim, baqU bîim ii min merivina nas kir. Di tevayiyê vê demê de ez jiyam û ez dikanim bibêjim ku min vatîniya xwe bê kêmasî bi cî hanî. Tew carekê jî bi sedema girtina xelatê, ez wekî namzed jî hatim pêşniyarkirinê. Dibe ku hiin tew jî bawer nekin, lê ez derewan nakim. Lê li dunyayê xêrnexwaz hertim hene! Binêrin berxika min, dibe ku ez merivekî nezan ii ehmeq bim, lê wek herkesî dilekî min jî heye. Ku hûn bizani bin xêrnexwazekî çî hanî serê min, Varenka! Meriv şerm dike ku bi lêv bike. Hûn ê bibêjin ku çima wusa kir? Ji ber ku ez merivekî bêdeng, dil-



tenik fi dilpak im loma. Hîn di destpêkê de ji min hez ne kirin fi dûre jî ezji ser zimanê wan ne ketim. Di destpêkê de: «Makar Alekseyevîç weha ye, wusa ye...» gotin û pir pesnê min dan, dfire: «De dev ji wî Makar Alekseyevîçîberdin!» gotin ii anuha jî dibêjin: «Dîsa Makar Alekseyevîç e!» U hfin êdî têtê-  
74

digêhîjin bê dawiya vê yekê bi kuderê ve derket, dayika min. Navê Makar Alekseyevîç bû gunehkarê hertiştî fi H deriidorê belav bii. Bi derxistina vê navnotiya navê min tenê jî ne ma. Ji potînên min heta unîform ii porê min, her tevgereke min ji

bo xwe kirin mijar ku li ser bipeyivin. Diviya bû min hertiştê xwe li gor wan biguheranda. Ê bi qasî ku ez bi bîr tînim, ev tiştê her rojên Xwedê dibe. Ez êdî hînî vî tiştî bûme, lewra ez hînî hertiştî dibim, ji ber ku ez merivekî piçîik ii bêdeng im. Ma çi pêwîstî ji van hemfi tiştên ha hebû? Min çi xirabî U kê kiri bii? Min rê U kê girti bû? Min giliyê kê bi amîran de kiri bfi? Na xwe ji bo ku ez têkevîm pêşiya hevalê xwe, min dekiidolabina li hev hanî bûn? Ma ne gunehkarî ye ku meriv van tiştên ha bifikirin, dako!

Dayika min, tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e ku ne ez merivekî durfi fi ne jî xwediyê dekûdolaba me... Ez têngêhîjim ku çima min gunehkarê van tiştan derdbdn! Xwedê min bibe-xişîne! Hiin, min wek yekî şerefmend dinasin, hûn ji wan gelek û gelek çêtir in. Lê dilpakiya herî bilind çi ye? Bi çend rojan beriya nuha Yestafi^ îvanovîç di nav civatê de (iigot, girîngtirîn dUpakiya hemwelatîyekî, berhevkirina peran e. Ev,

bi henekî hate gotin. (Ez dizanim ev henek e.) Lê dîsa jî tê de mebesteke nbcumandî hebû ku; diviya bfi meriv ji yekî din re nebiiya bargiranî. Û ji xwe ez jî ji kesekî re ne bûme bargiranî. Min jî pariyek nan heye, ya rastî nanekî hişk, ziwa û bêqatbc e. Lê min bi dilekî pak ii xwîdana eniya xwe ew bi dest xwe xistiye.

Gerçî ez bi xwe jî dizanim ku karê min, ne karekî wusa girîng e, lê dîsa jî ez keda xwe didim fi serê min cU ber de bUind e, çî bikim? Ma gunehkariya min e ku ez karê paknivîsê dikim? Çî gunehkariya vî karî heye? Çêlî min dikin ii cUbêjin: «Nivîsaran ji nii ve dinivîsîne!» Ma di vî karî de çî bêşerefî heye? Destnivîseke min î wusa xweşik fi delal heye ku kêfa

75

merivan jê re tê. Ekselansê me jîjê kêfxweş e. Û loma nivîsarên kaxezên herî girîng jî, ez jê re dinivîsînim. Gerçî metoda nivîsandina min pir xirab e, ez nikanim du hevokan bi awakî xweş bi hev bixînim. Ji xwe ji ber vê yekê jî di karmendiyê de ez bi pêş ne ketim. Loma anuha dema ku ez ji we re dinivîsînim jî, çî ji dilê min tê, ez rasterast U kaxezê dikim. Min hay ji vê yekê heye. Lê ku min jî dest bi nivîsandinê bikira, wê çaxê ew ê kê ev karê paknivîsê bikira? Û anuha ez jî vê pirsê dikim fi li bersiva wê digirim. Lê ez dizanim ku êdî ez jî ji bo civakê yekî pêwîst im ii pêwîstiya wan ji min heye. Dilê merivan U hev dixin fi dibêjin: «Mişkê kaxezan.» BUa wusa be. Lê mişkekî kêrhatî ye û pêwîstiya wan ji vî mişkî heye, bi xelatan riimetê jî didine wî.

De baş e, berxika min, em êdî dev ji vê mijarê berdî. Ya

rastî pêwîstiya vê mijarê ne dikir, lê ji dilpekiyê nizanim bê çawa hat ber devê min. Lê baş e ku meriv carina jî xwe ji neheqiyên bişo. Bi xatirê we horiya min, dosta min ya dUovan! Ez ê werim, bêguman ez ê werim serlêdana we fi bizani bim ka hiin çawa ne! Heta wê çaxê, hiin jî bêhna xwe teng nekin! Di hatinê de ez ê ji we re pirtûkekê bînim. Bi xatirê we, Varenka!

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîna we.

20ê Havîna Fêşîn

Mîrza Makar Alekseyevîç!

Di nav destê min de karek heye ku cUvê ez zû pêre bigêhînim. Loma ez ji we re vê namê wusa bi lez dinivîsînim. Binêrin ez ê ji we re çî bibêjim. Destdayîna kirîn û fnotinek gelekî

76

baş heye. Fedorayê ji min re got ku nasekî wê dbcwaze redîngotê xwe î fermayî, kincên binî, êleg fi kumê xwe bifroşe. Wusa xuyaye ew ê gelekî erzan be. Hîn ku destê we fere ye fi perên we hene, (Lewra hûn bi xwe jî dibêjin ku perên we hene.) divê hiin çikosiyê nekin û wan ji xwe re bikin. Pêwîstiya we ji wan heye. Ca li xwe binêrin bê kincên li we çiqasî kevin in! Bi rastî jî şerm e! Herçiqas hiin dibêjin «Kincên min yê nfi hene.» lê ez dizanim ku kincên we yê nfi tune. Xwedê dizane ka çî qewumî ii ew ji nava lepên we derketin. Hiin werin bi ya min bikin ii wan kincan ji xwe re bikin! Tew nebe, ji bo xatirê min, ku hûn ji min hez dikin wan bikin!

Weke diyarî we ji min re kincina şandine. Hiin tew rûmeta

perên xwe nizanin, Makar Alekseyevîç. We ji bo xatirê min gelek pere rijandin. Ev çi bongî ye! Pêwîstiya min ji tişteki tune. Ev tişteki fizfilî ye. Ez dizanim hûn ji min hez dikin û şika min ji viya tune. Lê ne pêwîste ku hiin rabin bi diyariyên xwe jî min haydarî vê yekê bikin. Hûn, min şermesar derdbdn.- Lewra ez dizanim ku ev diyariyên ha li ser we têne çi buhaja. Loma ez vê cara dawîn jî ji we lava dikim; êdî bes e, hfin têngêştin? Ji we tika dikim!

Makar Alekseyevîç, hfin ji min dbcwazin ku ez bîranînên xwe biqedînim fi wan beşên mayî ji we re bi rê bikim. Lê ew beşên nivisandî jî ez nizamim bê min çawa nivisand. Edî ez nikanim li ser rojên xwe yên berê bipeyivim û tew naxwazim li ser bifikirim jî. Lewra bîranîna wan jî tirsekê li min radike. Ya herî diwartir jî, dema ku ez çêlî diya xwe ya mihêr bikim. Diya ku ji bêgavî rebeneke nola min di nava lepên van bêbextan de hişt. Dema ku bi bîr tînim, agir bi kezeba min dikeve. Birîna min gelekî kwîr ii nfi ye. Li gel ku ev ji salekê zêdetir e ku wext di ser re buhuriye, lê hîn jî ez ne hatime ser xwe. Ji xwe hûn bi hertiştî dizanin.

Min ji we re çêlî Anna Fedorovnayê kiri bû ku ew li ser

77

min xwediyê çi dîtinan e. Min bi nankoriyê tawanbar derdixe û hevkarîya xwe ya bi mîrza Bukov re jî tew napejirîne! Pirî caran banî min dike ii bi min dide zanîn ku ez parsê dikim ii li ser riya xirab im. Sozê dide min, ku ez vegerim ba wê, ew ê navîna min Bukov xweş bike, ji bo wan xirabiyên ku wî li min kirine ew ê cî li wî teng bike. Li gor gotina wê, Bukov xwes-

tiyc bi min re bizewuce. Dev jê berde, Xwedê bi wan re be!  
Li vir, bi we re, li ba vê Fedorayê ez gelekî bextiyar im. Bi dil-  
soziya wê ya jidil, dadêya min dikeve bîra min. Herçiqas mer-  
vatiya min ii we ji dfir ve be jî, wek merivekî min, hfin bi navê  
xwe min diparêzin. Lê yên mayî, tew naxwazim navên wan jî  
bînim ser lêvên xwe, ku ji destê min were ez ê hemûyan jî ji  
bîr bikim. Hîn çî ji min dixwazin? Fedora dibêje, ev hemii  
devdirêjî ne ii ew ê di dawiya dawîn de dev ji min berdin.  
Xwedê bike wusa jî be!

V.D

21ê Havîna Pêşîn

Kevoka min!

Ez dbcwazim binivisînim, lê ez nizanim bê ez ê ji kuderê  
dest pê bikim. Ev jiyana me herduyan jî ecêbeke xweş e, ne  
wusa dako? Ez dbcwazim bibêjim ku cU jiyana xwe de ez tew  
rojên weha bextiyar ne jiya bfim. Mîna ku Xwedê malek, mal-  
batek kiri be para min jî. Dergiişa min ya rindik! Li ser wan  
çar perçe kincên ku min ji we re şandin, ma çî pêwîst dike ku  
hfin ewqas bipeyivin! Ez dizanim ku pêwîstiya we ji wan heye,  
min ji Fedorayê bihîst. Dibcweşkirina we, ji bo min jî bextiya-  
riyeke berbiçav e, dayika min. Ev kêfxweşiyeke min e û kêfa  
min nerevîne, berxika min. Astengiyê H min nekin fi nebêjin  
78

na! Di tevayiyê jiyana min de pêjneke weha xweşik li min ra-  
nebû bii. Mîna ku min nii dest bi jiyane kiri be. Beriya hertiştî  
ez êdî ne bi tenê me, nêzîkiya we dilê min xweş ii bêhtengiyê  
li min belav dike. Ya din, ji kirêdaran cîranê min î Ratazyay-

ev îşev ez vexwendime çayê. Li ser edebiyatê dîsa civînek ê çêbibe û em ê pirtfikan bixwînin.

Belê dayika min, hûn bi xwe jî dibînin, hiin dibînin bê em çawa ne! De bi xêr bimînin! Ev nameya ha jî bê sedem, tenê ji bo ku ez bextiyariya xwe bi we bidime zanîn, min nivisand.

We ji Terezayê re gotiye ku ji bona karê veçînîna nexşan, pêwîstiya we ji gulokên deziyên rengîn heye. Ez têdigêhîjim fi ez ê ji we re dezî jî bikirim, dayika min. Bi cîhanîna vê daxwaza we, ez ê sibe kêfxweş bibim fi ez dizanim bê ez ê li kuderê jî bikirim.

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

22ê Havina Fêşîn

Xatûnxan Varvara Alekseyevna!

Delala min, bi vê nama xwe ez ê bi we bidime zanîn ku di xaniyê me de biyereke pir xemgîn ii dilşewat qewumî. Îro saet U dor pêncê destê sibê piçîikê lawê Gorşkov mir. Ez nizanim bê ji ber çi, lê Xwedê dizane ji ber mîrkutokê bii. Ez çûm serlêdana wan. Di xizaniyeke wusa de ne ku hiin nikanin bawer bikin, dayika min. Lê tew tevliheviya mala wan!... Gerçî ne rewşeke ewqas seyr e, lewra tevayiyê malbatê di odeyekê de dimînin, bi navbirkan jî hatiye beşkirin ku şermesarî nebe. Tabiiteke piçfîk, lê gelekî xweşkok li wir bû, mîna ku hati bii amadekirin. Lawik nehsalî bii ii li gor ku dihate gotin, ji bo

79

rojên pêş lawik hêviyeke mezin bûye. Rewşa wan agir bi kezeba merivan dixist, Varenka! Diya wî ne digirîya, lê rebenê

gelekî xemgîn bii. Dibe ku bi çfiyîna lêwik barê wan parîkî si-  
vik bû, lê wan hîn zarokên din jî hene. Ji wan yek dergiîşekî bi  
şîr e fi ya din jî keçikek şeşsale ye. Çi rewşeke kambax e ku  
zarokê meriv li pêş çavên meriv di êş ii azarê de biqepije ii  
meriv nikani be tişteki bike! Paltoyekî kevn û bi çilkên riin U  
navpiyê bavê wî bii fi li ser sandaliyeke şikiyayî rfiniştî bii. Hê-  
sirên wî di ser hinarikên wî de dihatine xwarê, Xwedê dizane  
ne ji xemgîniyê, ji

xwiyekî kevn bfi ev. Çi merivekî seyr! De-  
ma ku tişteki jê dihat pirsîn, soromoro dibii, zûnanê wî H hev  
digeriya ii nizanî bii ku çi bersiv bida. Keçika piçûk xwe si-  
parti bii tabfitê; xemgîn, per^an fi bi raman ji xwe re sekinî  
bfi. Dema ku zarokek wusa bê deng fi bi raman be, ez hez na-  
kim, Varenka. Dilê merivan dişewutîne. Bfikikek ji paçikan  
çêkirî li kêleka wê bii. Lê bi biikikê ne dilîst, tUiya xwe xisti bii  
nava lêvên xwe û bêliv sekinî bfi. Xwediya malê şekirek da  
wê. Wê girt, lê ne xwar. Rewşeke xembar e, ne wusa, Varen-  
ka?

Makar Devûşkîn

25ê Havîna Pêşîn

Makar Alekseyevîçê hêja!

Ez pirtfika we bi şfin de dişînim. Pirtfikek gelekî xirab e,  
tcw ne hêja ye ku meriv wê vebike. Tiştên weha giranbuha  
hiin ji kuderê peyda dikin? Henek U hêlekê, lê ma bi rastî jî  
kêfa we ji pirtûkên weha re tê, Makar Alekseyevîç? Bi çend  
rojan beriya nuha we soz da min ku hiin ê ji min re tişteki hê-  
jayî xwendinê peyda bikin. Ku we bivê, em dikanin buhayê wê  
80

jî H hev par bikin. Anuha bi xatirê we! Anuha wexta min tune ku ez zêdetir binivisînim.

V.D

26ê Havina Pêşîn

Varenka delal!

Ya rastî min bi xwe jî ew pntûka ne xwendi bû, dayUca min. Gerçî min weha çavek U çend rfipelên wê gerand ii min dît ku gelek tiştên pêkenî û ehmeqî tê de hene ku meriv pê bUcene. Mm got qey ew ê ji bo we tişteki xweş be, loma min jî rabû ji we re şand.

Lê anuha Ratazyayev soz daye mm ku ew ê ji hêla edebî de berhemeke rastkîno bide min. Hiin ê jî êdî bê pntfik nemînin, berxika min. Ratazyayev ji heq vî karî tê der, merivekî zîrek fi bi xwe jî gelekî xweş dinivisîne. Nivisa ku ji pênfisa wî, weke avê diherike ii stîla wî bi mane ye. Hevokên herî hişk fi sivik jî, (Mîna wan hevokên ku ez di peyivîna xwe û Faldonî an jî Terezayê de bi kar tînim.) ew bi wê stîla xwe manedariyeke xurt ii berfere dide wan. Çi stîl e! Ew civînên ku H ser edebiyatê li ba wî çêdibin, ez jî diçim û beşdarî wan dibim. Em titiinê dikêşin û guhdarî dikin, ew jî bi dengekî bilmd he-ta pênc saetan dbcwane. Mîna ku edebiyat ne, rasterast xwarina berhemên xweşmeze be! Meriv pê sermest dibe, ewqas xweş e ku meriv dikare ji her riipelekê qevdek kuUUc bUiûne! Ratazyayev jî merivekî nazik, zarxweş ii baş e. Li hemberî wî ma ez çî me ku! Oet tişteki! Ew merivekî bi navûdeng e, lê ez? Hebûn ii tunebfina min yek e, lê dîsa jî Xwedê jê xweş be mêrUc ji min re baş e fi pesnê min cUde. Carina ez nivisarên wî jê



re paknivis dikim, Varenka. Lê dêvê tiştekiweha neyê ser hi-  
81

şê we ku ew ji bo paknivisa nivisarên xwe pesnê min dide. Bi gotinên vala bawer nekin, dayika min. Hfin guhê xwe nedin gotinên xelkê. Na, ez viya ji kêfxweşiya dilê xwe dikim. Ew jî ji min hez dike û loma gotinên weha dike. Ez van kirinên wî yên barîk pir baş têdigêhîjim, dako. Ew merivekî pir fi pir baş e, niviskarekî bê hemta ye.

Edebiyat tişteki gelekî baş e, Varenka. Ez viya jî pê di nava wan de hîn biim. Mijareke kwîr fi berfere ye. Dilê merivan xurt ii paqij dike. Pirtiika ku dbcwendin, U ser vê yekê tê de gelek ramanên wekîdin jî hebfin, ramanên baş ii vekirî. Edebiyat dişibe tabloyekê, ya rastî him tablo ii him jî neynikek e. Pêjnên xurt, rexnên hûr, hiinandin fi dokumentên merovatiyê. Ev hemii tiştên ha, ez U ba wan hîn bfim. Lê divê ez ji we re rastiyê bibêjim, dako, ez di nav wan de riidnim, bi wan re fi weke wan qeliinê dikêşim. Lê dema ku ew dest pê dikin fi li ser mijarên têvel dikevîne galegalê, mîna ku di lîstika qeremaçan de tê gotin, ez dibêjim pess. Ma yekî nola min ê bikani be wekîdin çi bike, dako? A wê çaxê mîna qoncê darekî ez di ciyê xwe de rûdinim ii ji xwe şerm dikim. Li gel ku ewqas dixwazim bi peyvikek xwe ez jî beşdarî şevbuhurka civatê bibim, lê ez nikanim bi ser kevim. Di demên weha de ez U ber xwe dikevim, di xwe de dişewutim ku di wexta xwe de çima min jî tişteki ne da ber xwe û pê ne biim meriv. Lê êdî pere nake! Mîna ku ez ji dunyayê bêhay jiya bim, nola ku min riyê xwe H ber tavê sipî kiri be. Çi tişteki xirab e! Di wextên xwe yên vala

de ez çî dikim? Ez wek kundirekî hew radikevim. Lê ji dêla raketinê ve diviya bii min mijfiliyeke baştir bida ber xwe. Serqisê, ez riiniştama ii min binivisanda. Ew ê ji bo min tiştêkî hêja bûya ii ew ê bi kêrî gelek kesên din jî bihata. Lê tew we bizanî biiya bê çî pere bi dest van dUceve! Xwedê zêdetir bike! Serqisê em bibêjin, Ratazyayev, ji bo wî nivisandina rfipelekî tew jî ne karekî çetin e. Di rojekê de ew dikane pênc

82

riipelan jî binivisîne ii U gor gotina wî, ji bo her rûpelekî jî 300 riibUî distîne. Pêkenîneke tûj an jî novelekê binivisîne, daxwaza pênc sed rfibilî dike. Ku weşangêrek xwe nede ber dajîna vî pereyî, tew ne xema wî ye. Lewra ew pêşkêşî yekî din dike û herweha hezar rûbilî dikurisîne bêrîka xwe. A vmsa, Varvara Alekseyevna! Baş e, ne wusa? A ji we re nimûneyek cUn jî, wî deftereke helbestan heye, fi ne sitiir e jî. Lê ew ji bona wê heft hezaran dbcwaze, dako, ca bifikirin heft hezar! Ev rasterast hebîina dewlemendiyekê ye, xaniyekî mezin e! Li gor gotinan, pêşniyara pênc hezaran havêtine ber v/î, lê ew pê qajol ne bfiye. Ez dixwazim bixapînim û jê re cUbêjim: «Serê wan bbcwe! Wî pênc hezarî bigirên, bavikê min. Pênc hezar jî ne hindik e.» Lê ew dibêje: «Na, divê ev bênamfisên ha heft hezairan bidin!» Bi rastî jî merivekî jîr e.

Ji ber ku em ketine nava vê mijarê, ya baştir ew e ku ji berhema wî ya bi navê «Girtiyên îtalî» ez ji we re beşekî binivisînim. Bixwînin fi hûn bi xwe binirxînin, Varenka!

«Tevayiyê laşê Vladîmîr lerizî. DUtengiyeye xurt lê rabû, xwîna di rehên wî de lê keliya ii bi qêrîn got:

- Kontes, kontes! Ma hiin dizanin bê ev dUtengiya we, ev kêmaqUiya we tiştêkî çiqas xirab e. Na, cU baweriyên xwe de ez ne çewt biim. Ez ji we hez dikim, bi tevayiya hebûna xwe, wekî dînekî bi her awayî ii bi evîneke har fi xiu^t ez ji we hez dUcim! Tevayiya xwîna mêrê we jî nikane vê kewkeU û agirê cU ruhê min de vemirîne! Ev dilê ku di defa sîngê min de bi êş, azar fi bi agirekî dojhê dişewute, astengên woisa piçûk nika- ne xwe li ber bigirên. Ax, Zînaîda, Zînaîda!

Kontesê bi rewşeke sermest û bêhêvî serê xwe siparte mUê wî û bi dengêkî nizm gotê:

- Vladîinîr!...

Kesereke kwîr ji hundurê defa sîngê wî derket. Reviyên agirê hêviya evîne dilê herdu qurbanên xwe yên bextreş so-  
83

tand.

Kontesa ku sermest bfi bfi, her bi wî dengê xwe yê nizm cU- got:

- Vladîmîr!...

Hinarikên ruyê wê sor bû bûn, çavên wê dibiriqîn fi sîngê wê nizm fi bUind pêl dida.

Ev zewaca nfi fi kambax hate girêdanê!

Piştî nîv saetekê Kontê pîremêr kete hundurê bodoara(\*)

jina xwe, destê xwe di hinarikên wê re da û got:

- Ma ji bo mêvanê me yê xoşewîst tu semawerê nadî ama- dekirinê, canekem?»

Li ser vê yekê ka hfin çi dibêjin, dako? Dibe ku hinekî ve- kirî be, şika min jî ji vê yekê tune, lê dîsa jî xweş e. Di ser tiş-

tên xweş de nayê şikandin. Bi destîra we, ez ji we re ji çîroka Yermak ii Zuleyxayê jî beşekê lê bikim. Ca bifikirin, dako, Yermak î kazak serdarekî dirênde, zordar fi serketiyê gelek şeran e. Kiiçfim î Çarê Sibîryayê dîlketiyekî destê Yermak e û Yermak bi xwe jî evîndarê Zuleyxaya keça Kiiçfim e. Wek ku tê zanîn, bûyer di dema îvan î Kambax de diqewume. Ew ga-legalên ku di navîna Yermak ii Zuleyxayê de dibin, beşek jê eve:

«- Tu hez ji min dikî, ne wusa Zuleyxa? Ducar bike, ducar! Zuleyxayê bi dengekî nizm gotê:

- Ez ji te hez dikim, Yermak.

- şikir ji we re, erd ii asiman! Ez bextiyar im! We hertişt, hertiştê ku ev ruhê min î dilpekîn ji piçîiktî de bendewar bii, we pêşkêşî min kir. Sitêrka jiyana min, de qeyê ji bo vê yekê bii ku te berê min di ser kevirên Ûrala malşewutî re da vir fi te ez kişandim vir. Ez ê Zuleyxa xwe pêşanî hemfi dunyayê (\*) Bodoar: Jifransîtê. Ji bojinan ode, anjîsalona arizî WW  
84

bidim. Tu merivekî har fi devbikef jî ew ê êdî newêri be li ser vê yekê min gunehkar derxîne. Ax, ku wan ev êş ii azara di ruhê wê î tenik de fam bikira, ku wan bikani bfiya manedariya di dilopeke hêsirên Zuleyxa min de ji hev derxista! Ox, îcazê bidine min ku ez wan hêsiran bi ramiisanên xwe zuwa bikim! Bihêlin ku ez wê dUopa hêsirên pîrozwer vexum, keçika asimanî!

Zuleyxayê bi qêrîn got:

- Yermak, dunya xirab e, meriv bêbext in! Ew ê bi pey me

bikevin ii me gunehkar dendn, Yermakê min. Rebeneke nola min di konekî bavê xwe de, di nav berfa Sibîryayê de mezin-bfiyî, ka ew ê di dunyaya we ya xwînsar, bêruh û çikos de çawa bijî? Merivina ê min fam nekin, xoşewîstê min! Çavên Yermak di kortikên xwe de ne hewiyan ii bi hêrs got:

- Wê çaxê ev şîirê min î kazakî ê ji kalan derkeve, li ser serê wan here fi were!»

Dema Yermak dibihîse ku dergistiya ber dilê vn hatiye kuştin, ew rewşa ku ew dikeviyê êdî hiin bifikirin, Varenka. Ji xêra tariya şevê ii li wir nebfiyîna Yermak, Kfiçûmê pîremêr î kwîr bi dizî heta ber konê Zuleyxayê diçe. Ji bo ku birîneke mirinê di dUê Yermak de vebike -Yermakê ku tac ii textê wî ji dest girti bfi- radibe keça xwe ya helal dide ber xençeran. «Çavên Yermak ji kербana di kortikên xwe de lîzikîn, devê şîirê xwe di hesan re da û bi qêrîn got:

- Di tûjkirina hesin de, dengê ku jê derdikeve kêfa min pir jê re tê. Min xwîna wan divê, xwîna wan! Divê ez wan perçe perçe bikim, hemiiyan piçî piçî bikim!»

Piştî vê mirina Zuleyxayê hêviya jiyanê li Yermak diherime, diçe xwe davêje çemê îrîşê ii herweha dawiya çîrokê tê. Ev jî beşekî kurt e, ji stîla pêkenînê nimfineyek e. Ez viya jî ji we re binivîsînim.

85

«Ez nizanim bê hiin îvan Prokoye\aç Zeltopuzov nas dikin, an ne? Ew î ku di çîpa Prokofî îvano\aç de gez kiri bii. îvan Prokoyevîç hişk e, lê merivekîbaş e. Prokofî îvanovîç gelekî ji

tirpên bejî ii hunguv hez dikir. Di dema dostarûya xwe ii Pelageya Antonovnayê de... Ez nizanim bê hûn Pelageya Antonovnayê nas dikin, an ne? Ew ya ku hertim fîstanê xwe vaca H xwe dikêşand...»

Hfin bi xwe jî dibînin, Varenka, ev pêkenînên ha wusa ne ku tew nayên gotinê. Dema Ratazyayev ev ji me re dbcwend, em ji ken hişk dibfin. Merivekî wusa ye, ew! Gerçî ev nivisa ha hinekî sivik û aliyê wê yê qeşmeriyê zêdetir e, lê pevxistina wê ne xirab e. Dayika min, divê ez viya jî bi we bidime zanîn ku Ratazyayev merivekî zana ii niviskarekî rastîn e. Ne wekî wan niviskarên din e.

Carina tê hişê min ii ez xwe bi xwe dibêjim: Ku min jî tiştina binivisanda, gelo ew ê çawa bibûya? Serqisê, di rojeke xweş de meriv hew bidîta ku bi navê Helbestên Makar Deviişkîn pirtiikek derket. We ê çi bigota, horiya min? Li ser min çi raman ê li we çêbibfiya û we ê çawa şirove bikira? Lê ez dibêjim ku piştî derketina pirtfika xwe, bi rastî jî min ê newêri biiya gava xwe bavêta kuça Nevskiyê(\*). Herkesê ku di kuçê de çav li min biketa, ew ê bigota: «Ca binêrin, niviskarê berhemên edebî, helbestvan Dcvûşkîn ew e!» Wê çaxê ez ê têkelama çi rewşê? Serqisê, min ê potînê xwe çi bikira? Anuha di cî de ye ku ez viya jî bibêjim, dayika min, ya rastî di potînê min de ciyekî bê pîne ne maye. Binê wan jî carina wext bêwext ji hev dikevin. Ca bifikirin, herkes ê bizani bin ku potînên Deviişkîn î niviskar bi pîne ne, ez ê çi xweliyê H serê xwe bikim, wê çaxê! Konlesek an jî dotmîrek bibihîse, kî dizane ku cw ê çi bibêje! Dibe ku tew bala wê jî nekişanda, H gor bawe- (\*) Kuça Nevskiyê: Li Petersbûrgê kuça herî bizavbar e. WW

riya min kontes guhê xwe nadin potînan, ii potînên karmendan tew jî bala wan nakişînin. Ji ber ku potîn hene ii potîn jî hene. Lê dîsa jî hinekan ê ji wê re bigota, lewra devê dostên min sist in. Berî herkesî Ratazyayev ê ev devsistiya bikira. Ew pir diçe serlêdana Kontes V'ê fi li gor gotina Ratazyayev, wext bê wext ew hertim diçe mala wê û dibêje, ew jineke xwînşêrîn fi tégêhîştîya edebiyatê ye. Ev Ratazyayeva jî çi merivekî serjinik e!

De baş e, em dev ji vê mijarê berdin êdî. Horiya min, ji xwe ji bo ku hinekî zimandirêjî bibe û hûn jî pê xweş wexta xwe derbas bUcin, ez dinivisînim. Bi xatirê we, kevoka min! Min serê we gelekî êşand. Ya rastî, ez îro pir kêfxweş im loma. îro me hemîyan li ba Ratazyayev şîv xwar. Çi merivên qeşmer in! Hanîn şerabeke taybetî jî li ber me danîn ku... Lê baştir e ku ez ji we re çêlî viya nekim. Li ser min, bUa tişteki xirab neyête hişê we, dako. Ev hemû tiştên ha, ne ji bo tişteki ez dinivisînim. Ez sozê didime we ku ez ê ji we re pirtfikan bişînim. Li vir romaneke Paul de Kock heye, herkes ji dest hev dnevinin. Lê ez ê wê ji we re neşînim, na. Paul de Kock, ji we re nabe, dako. Li gor ku dibêjin, hemû rexnegirên Petersbûrgê ji berhemên wî nerihet in. Ez ji we re fûntek şekir bi rê dikim. Tenê ji bo xatirê we min kirî bii. Li we noşîcan be, dako. Û her cara ku hfin libekî dbcwin jî, min bi bîr bînin! Lê şekirên hişk in, tê de gez nekin, wan bimijin, an ne diranên we ê bêşin. Ez nizamim bê hûn ji şekirên nerm jî hez dikin, an ne? Ku we bivê, ji min re binivisînin! De bi xatirê we! Sitara Xwe-

dê U ser we be, kevoka min! Heta dawiya jiyana xwe jî hevalê  
we î dUsoz.

Makar Devûşkîn

87

27ê Havîna Pêşîn

Berêz Mîrza Makar Alekseyevîç!

Fedorayê ji min re çêlî çend kesan kir ii got, ku ez bixwazim cw ê bikani bin ji bo min ciyekî baş, di xaniyekî de karê dadêtiyê peyda bikin. Ka hiin çi dibêjin, dostê min? Ez karekî wusa bigirê, an ne? Bi kêmanî ez ê êdî ji we re nebim bar fi wusa xuyaye perê wî jî pir e. Lê tirsê dUê min ew e ku ez ê çawa di nava malbateke biyanî de debar bikim. Malbateke dewlemend fi xwediyê wargehan e. Ew ê ji min pirsina bikin fi bixwazin ka ez kî me, çi me. Wê çaxê ez ê çî bersivê bidim. Ez yeke pir şermok ii kiivî me, quncikê ku ez hînî wê bûme, naxwazim jê dûrke\am. Li gel jiyaneke bi kul û kovan, dîsa jî meriv daxwaza cî ii warê xwe dike. Di ser de jî rêyeke diir û dirêj e ii Xwedê dizane bê ew jî çi kar e. Dibe ku tew dadêtiya zarokên piçfîk bidine ber min. Wusa xuyaye xwediyên wê malbatê jî bi xwiyekî wusa ne ku di du salan de sê dadêyan diguherînin. Ji bo Xwedê, Makar Alekseyevîç, hiin aqilekî bidinc min. Ez çi bikim?

Ya din, ma çima hiin tew nayên mala me? Kê mî caran, fi ew jî ji dfir ve meriv çav bi we dikeve. Tenê rojên yekşemiyên em li dêrê hevdu dibînin ii hew. Hfin çiqas xwe ji merivan vedikişînin! Rasterast mîna min... Ê qaşo merivatiya me jî ne cwqas dfirî hev e. Na xwe hiin êdî ji min hez nakm, Makar



Alekseyevîç? Carina ev tenêtiya min xemgîniyeke wusa dadi-  
xc ser min ku! Nemaze pirî caran jî bi tariya êvarê re ez bi ti-  
kiitena serê xwe li malê dimînim. Fedora bi derekê de diçe.  
Ez jî riidim û dikevim ramanan, kêfxweşî fi xemgîniya rojên  
buhurî tînime bîra xwe. Mîna ku ji nava mij ii dfimanê derke-  
vin, ruyên nas têne ber çavên min. Ez wan ruyên ha pn zelal  
dibînim, pirtirîn ez ruyê diya xwe dibînim. Çi xevraên tevli-  
hev! Ez hîs dikim ku saxiya min jî ne maye. Ne baş im. Vê si-  
88

bê jî ez bi nerihetiyeke mezin ji xew rabfim. Ji bilî viya jî kuxi-  
kek xirab bi min girtiye. Ez dizanim û hîs dikim ku mirina  
min ne dûr e. Kî ê meytê min hilîne fi heta goristanê bi min re  
were? Kî ê ji bo min têkeve şînê? Û dibe ku mirina min ê li  
quncikekî xerîbiyê û di nava merivên biyanî de bibe. Xwedê,  
çi jiyaneke xemgîn e ev, Makar Alekseyevîç!

Kavirê min, ev çi şekir in ku hiin ji min re bi rê dikin? Bi  
rastîjî ez têngêhîjim bê hûn van peran hamfiyan ji kuderê tî-  
nin. Ax, dostê min, ji bona Xwedê van perên xwe ewqas tarfi-  
mar

nekin!

Xalîçeya

ku

min

veçinîye,

Fedora

ê bifiroşe.

Pênce riibU pê dane. Bi rastî jî pereyekî baş e, min bawer ne

dikir ku ew ê bi ewqasî bike. Ez ê sê rûbUan bidime Fedorayê. Ji xwe re jî ez dbcwazim kincekî sade, lê hinekî germ bidiriim. Ji bo we jî ez ê ji qumaşê baştirîn êlegekî bi destê xwe bidiriim.

Fedorayê ji min re pirtfikek bi navê «Çîrokên Biyelkîn» peyda kiriye. Ku hûn bixwazin wê bixwînin, ez ê ji we re bi rê bikim. Lê ez tika dikim ku bila gemar nebe. Zêde jî bila li ba we nemîne fi bi şfin de bişînin. Lewra ne pirtfika min e. Ev berhemeke Pfişkîn e. Ev çîrokên ha, beriya du salan min fi diya xwe bi hev re xwendî bfi. Loma jî anuha dema ez ji nfi ve dixwînim, bi min xemgîn tê. Ku li ba we hebin, ji min re çend pirtûkan bişînin, lê bila ne ji yên Ratazyayev bin. Dibe ku berhemeke wî ya nfiçapbfîyî hebe fi ew wê bide we. Lê ji berhemên

wî

re

çawa

kêfa

we

tê,

ez

tênagêhîjim,

Makar

Alekseyevîç? Tiştên weha pfiç îî vala! Bi xatirê we! Min pir zimandirêjî kir. Dema ku dilê min wusa teng cUbe, cUxwazim ji vir fi wir bipeyivim fi pê diltengiya xwe belav bikim. Wek dermanekî ye, meriv pê rihet dibe, bêhna meriv fere dibe ii nemaze dema ku meriv hemû tiştên di dUê xwe de bêbêje. Bi

xatirê we, dostê min, di xweşiyê de bimînin!

V.Dya we

89

28ê Havîna Pêşîn

Dayika min, Varavara Alekseyevna!

Dev ji xemxwariya xwe berdî! Ma hûn şerm nakin!

Hfin çawa serê xwe di ber van tiştên vikûvala de dêşîn. Hiin ne nexweş in, kevoka min, hûn tew jî ne nexweş in. Hfin weke gulekê vedidin. Erê gwînê we hinekî vemirî ye, lê dîsa jî hfin weke kuUlkekê ne. Ew çi êşa xewn û ramanan e bi we girtiye. Şerm e, horiya min, dev ji van asiiwasan berdî! Ca U min binêrin, çima ez baş dbcewim? Çima tişteke bi min nabe? Ez ji xwe re dijîm, raketina min xweş e, saxiya min baş û ez weke pîvaz im. Bi rastî jî xelk dilbijokên vê rewşa min in. Hişê xwe bidine serê xwe û êdî li xweşiya xwe binêrin. Ez dizanim bê hiin çi difikirin, dayika min: Dîsa we tişteke girtiye, hfin li ser difikirin û pê xwe diqahirîn. Ji bona Xwedê dev ji van tiştan berdî, dako!

Karkirina we ya li ba hinekên din? Na, na, na û dîsa na!

Hûn çawa xwe li tişteke weha datînin. Ê U dfirî bajêr. Na, dako, destfira tişteke weha ez tew nadim û heta ku ji destê min jî were, ez ê H hemberî planekî weha rawestim. Ku pêwîst bike, ez ê frakê xwe î kevn bifiroşim, bi bertena îşligê derkevime kuçê, lê dîsa jî ez ê we di tengasiya tunebûnê de nehêlim. Na, Varenka, na! Ez we nas dikim. Ev tiştên ha, dînitî ye! Ê ez baş dizanim ku ev hemfi ramanên ha ji bin serê wê Feodora nerind derketine. Ew e ku we ji rê derdixê. Lê bi wê bawer

nekin, dako! Bi rastî jî hiin bi wan nizanin, ruhika min. Jini-  
kek wusa ehmeq, zimandirêj fi bêcir e ku jiyana mêrê xwe î  
rihmetî jî lê kire jahr. Xwedê dizane, wê wusa hûn nerihet ki-  
rine, ne wusa? Na, dako, nabe! Ez ê çi bikim wê çaxê? Bi ku-  
derê de biçim? Na, Varenka, van tiştan ji serê xwe bavêjin,  
ruhika min! Ma li vir çiyê we kê m e. Em we ji çavên xwe dis-  
itirînin. Hiîn jî ji me hez dikin. Li vir riinin ii li kêfxweşiya xwe  
90

bmêrin. We divê dirfinê bikin fi we divê bbcwnin. Hûn çi dbc-  
wazin, bikin. Lê li ba me bimînin. Êdî hfin bi xwe birayara  
xwe bidin ka dawiya çûyînê çawa dixuye. Ez ê ji we re çend  
pirtûkan peyda bikim, ii dibe ku em dîsa ji xwe re derkevîne  
seyrangerê. Lê divê hûn jî êdî hişê xwe bidine serê xwe û tiş-  
tên weha piiç ji xwe re nekine serêş. Di demeke nêzîk de ez ê  
werim mala we. Lê di vê navberê de divê hfin destûrê bicUne  
min ku ez rastereast bibêjim: tiştên ku hûn dibêjm, ne baş m,  
dayika min, tew ne baş in! Ez bi xwe jî dizanim ku ez ne meri-  
vekî xwenda me, hîndekariya min ya dibistanê jî bi awakî kê m  
û kurt bfiye. Lê ez çêlî xwe nakim, ji xwe pirs jî ne ez im. Li  
dUê xwe negirên, lê ez pesnê Ratazyayev didim û vn cUparê-  
zim. Lewra ew hevlekî min e. Li gor dîtina min pir xweş di-  
nivisîne, pir pir xweş dinivisîne. Li ser vê yekê ez ne bi dîtina  
we re me îî ez ê weke we nefikirim. Stîla nivisandina wî ren-  
gîn ii Uhevhatî ye, hevokên wî bi dewlemendiyeke têvel e, pir  
ii pir xweş e. Dibe ku di xwendina berhemên v/î de rewşa we  
dest ne dabe, Varenka, an jî di rewşeke kêfre\an de we xwen-  
di be, kî dizane, dibe ku di wê gavê de hfin ji Fedorayê hêrs-

biiyî bûn, an jî bêhtengiyêke din. Lê na, cUvê cU wexteke vala de, dema ku serê we zelal ii kêfa we U cî be, serqisê dema ku hûn şekirckî davêjin devê xwe, a wê çaxê bi baldarî bixwînin. Ez li hember dernakevim ku -û kes jî nikane- niviskarên ji Ratazyayev çêtir jî hene. Dibe ku gelek çêtir jî hebin. Ew jî baş in û Ratazyayev jî baş e. Hemfi jî xweş cUnivisînin. Lê ew jî U gor xwe, ji xwe re tiştina cUnivisîne fi baş jî cUke ku cUnivisîne. De di xweşiyê de bimînin, dayika mm! Ez pêre nagêhînim ku zêde binivisînim. Karê min heye, cUvê ez lez bikim. Ji bona Xwedê xwe ne qehirînin! Xwedê bi we re be!

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

91

NOT: Ji bona pirtûkê gelek sipas. Em ê Pûşkîh jî bixwînin.

Îşev ji sedî sed ez ê werim mala we.

lê Havîna Navîn

Makar Alekseyevîçê min î giranbuha!

Na, dostê min, na! Bi vî awayî ez ê nUcani bim êdî di nav we de bimînim. Ez gelekî li ser ramiyam fi ez gêhîştim wê baweriyê ku çewtiyêke mezin e ku ez xwe ji karekî wusa xêrêndar diirbbdm. Li wir, bi kêmanî ez ê bizani bim ku hertim pariyek nanê min heye. Ji bo ku ez xwe bi kardarên xwe bidime hezkirinê, çi ji destê min were ez ê bikim. Ê ku pêwast bike ez ê xwiyê xwe jî biguherînim. Bêguman ne tiştêkî rihet e ku meriv di nav biyaniyan de bijîn fi hewceyî pariyê nanê ber deriyên wan be. Dijwar e ku meriv hertim xwe biguvişîne û xwe ji hertiştî bide hev, lê min hêvî heye ku Xwedê ê alîkariya

min bike. Ez nikanim heta dawiya jiyana xwe, xwe ji xelkê vekêşim. Berê jî weha bû bfi. Tê bîra min, di piçûktî de dema min di dibistana dewletê de dixwend, rojên yekşemiyên ez dihatim malê. Min nerindî dikir, ez har dibiim fi diya min jî li min hêrs dibii. Lê ez tew pê ne dêşiyam, dilê min dîsa xweş fi kêfa min li cî bû. Lê dema ku êvar nêzîk dibfi, xemgîniyekê bi min digirt û bêhna min teng dibii. Lewra saet li nehê şevê ez ê dîsa vegehiyama dibistanê. Li wir hertişt sar, hişk ii biyanî biin ji bo min. Rojên duşemiyên mamostên me her bi hêrs biin, dilê min jî teng dibû fi min dixwest ez bigirîm. Ez vedikişiyam quncikekî fi bêdeng bêdeng ji xwe re digirîyam. Navê teraliyê bi pey min xisti bûn, lê ne ku ez ji ber xwendina dersên xwe digirîyam. Lê dfire? Min ewqasî bêhna xwe dabû ser ku, min ne dbcwest ez ji dibistanê dfirkevim. Dema ku min xa-

92

tu" ji hevalan dbcwest, em digirîyan.

Ez dizanim ku ez ji bo we herduyan jî barek im. Ev ne tiştetekî baş e û ez pê dêşim. Van hemfi tiştên ha ez ji we re vekirî dibêjim, lewra ez hîn bfime ku li hemberî we dîtînen xwe bi awakî vekirî bibêjim. Ez bi xwe jî dibînim ku Fedora her sibe zfi radibe, bi rastkirina hawurdor dikeve fi heta tariya şevê jî kincan dişo. Ku meriv rastiye bibêje, ji bo merivên pîr rihetî divêt. Min hay jê heye ku ji bo xatirê min, hfin xwe ji tiştêkî nadin paş ii ji hêla peran de hiin heta kopêkê xwe yê dawîn jî H min xerc dikin. Ji xwe hebfin we çiqas e ku! Hûn dinivîsin fi didine zanîn ku hiin ê kincên li na\^iyê xwe jî bifiroşin ii dîsa hfin ê min di tunebînen de nehêlin. Belê, dostê min, ez ji

vê dilpakiya we bawer im. Hemii hêviya we jê ew perên lotima nepayî ye. Lê diire ew ê çi bibe? Hiin bi xwe jê dizanin ku ez hertim nexweş im. Li gel ku ez ewqas dbcwazim jê, ez nikanim bi qasî we kar bikim î karekî min î hertimê jê tune. Ez ê çi bikim? Dema ku ez li we herdu merivên dilpak dinêrim, xwe bi xwe dişewutim. Ma ka ez ji bona we bi kêrê çi têm? De ka çi pêwîstiya we ji min dibe, dostê min? Ma çi çêyiya min gê-hîştîye we? Tenê ji dil î giyanê xwe ez bi we re me ii bi dilekî germ ii pêt ji we hez dikim. Lê êşa dilê min e ku çarenfisa min tenê dilekî tenik daye min, dilekî ku ji bilê hezkirinê bi kêrê tiştêkî nayê. Ne rewşa min dest dide ku ez rindiyekê U we bikim, ne jê dikanim çêyiyekê U çêyiya we vegeînim. Êdî min ji riya min nekin. Baş bira min ii gotina xwe ya dawîn ji min re bibêjin. Evîndar ii bendewara bersiva we me.

V.D

93

lê Havîna Navîn

Ev peyvên ha vikfivala ne, Varenka, vala!... Ku meriv cU ser we de nebêje, kî dizane hiin ê hîn çi tiştan di serê xwe de çêkin! Nizanim, ev weha ye fi ew weha ye... Hemii jê piiç fi vala nc. De ka ji bona Xwedê bibêjin, ma çiyê we kême. Em ji we hez dikin û hiin ji me. Em hemii jê ji hev xweş û bextiyar in. Wekîdin em çi dbcwazin? De ka çi karê we li ba malbatên biyanî heye? Xuyaye hfin hîn nizanin bê malbatên biysmî çawa ne. Lê bihêlin ez ji we re bibêjim ka ew çawa ne. Ez bi vê yekê dizanim, dako, ez baş dizanim. Lewra min nanê ber deriyan xwariye. Merivên biyanî xirab in, Varenka, ewqas xirab

in ku dilê we ê kul bikin; bi gotinên xwe, bi nebaşiyên xwe, bi nchirînên xwe yên nerind ew ê we bêşînin. Di nav me de ciyê gcrn fi xweş, rasterast mîna ku hûn di hêlînekê de bin. Hûn çawa me \\aisa di cî de dihêlin? Em ê bêyî we çi bikin? Pîre-mêrekî nola min ê çi bike, wê çaxê? Ango hiin bi kêrî me naycn, hi!... Pêwîstiya me bi we tune, ne wusa? Ev çi gotin in, hiin dikin! Ca bi xwc bifikirin bê hûn çiqasî ji bo me pêwîst in. Çêyiya we ya li min gelekî mezin e, Varenka, ii we bando-reke pir baş li min kiriye. Anuha jî ez we difikirim fi ji ber vê yekê ye ku ez wusa kêfxweş im. Carina ez ji we re nameyan dinivisînim, pêjnên dilê xwe dirijînim ser î bersivên dfirûdirêj ji wc distînim.

Rast e, çend kincên we, min kirîne fi min ji we re kofîyek daye çêkirinê. Carina jî suxrê we yên ku bi min dikevin, ez wan dikim ii hew!... Na, Varenka, çawa çêyiya we bi min nabe? Bi vê pîrbfina xwe ez ê bi tena serê xwe çi bikim? Ez ê bi kêrî çi werim? Ez yê ku hişkfirî bi we ve hatime girêdan, ma tew hfin ne fikirîn ku ez ê çi bikim? Ez ê biçim û xwe bavêjim çemc Nevayê, bila ez bbceniqim fi hertişt biqede. Belê, Varcnka, hûn bi xwe jî dizanin ku ez bêyî we nikanim bijîm. Of, 94

Varenka, wusa xuyaye hfin dixwazin min li duruşka bar bikin ii bişînin goristana Volkovoyê. We divê ku bila ji bêkesiyê, pî-rejineke parsek tenê bide dfi tabfita min, xweliyê bavêjin ser min fi min bi tikiitenê bihêUn! Gunehkarî ye, dako, gunehkarî! Ev li ber Xwedê, gunehkariyeke rastkîno ye!

Ez pirtiika we bi şfin de dişînim, piçfika min. Ku hfin bbc-



wazin li ser pirtîikê dîtina min bipirsin, ez viya jidil dibêjim ku heta roja îroyîn jî min berhemeke weha xweş ne xwendiyê. Û anuha ez ji xwe dipirsim, dako; heta nuha jî çawa ez weha wek êzingekî jiyame? Min çî bi ser hev xistiye? Ji nav darên kîjan cengelî derketime? Ez qet tiştêkî nizanim, dako, nizanîm! Ez ji we re rasterast bibêjim, Varenka: Ez merivekî nezanim. Heta nuha min gelek kêmtir xwendine. U ne çewt e ku ez bibêjim, min qet tiştêkî jî ne xwendiyê. Tiştên min xwendine, bi navê «Nîgara Meriv» berhemeke hêja, «Zarokê ku bi zengilan pêkenînê cuda cuda lêdixist» î «Qulingên îvikov» A hemfi tiştên ku min xwendine, ev in. Anuha jî di pirtîika we de min «Karmendê îstesonê»(\*) xwend. Dayika min, lê divê ez ji we re bibêjim ku carina meriv hay jê nabe ku tevayiyê jiyana meriv di pirtîikeke li paş serê meriv da hatiye nivisandin. Dema meriv wê dixwîne, ew tiştên ku tew nayên ser hişê meriv jî, hêdî hêdî dikevîne bîra meriv ii U ber çavên meriv reng vedidin. Çima min ewqas ji pirtîika we hez kir, ez bibêjim: Hinek pirtîik hene, meriv wan car bi car dixwîne ii serê xwe di ber de dêşîne, lê ji ber ku bi tevliheviyeke giran hatine nivisîn, meriv tiştêkî têngagêhîje. Serqîsê, ez di çêbîna xwe de merivekî serhişk im, hişê min di ber gelek tiştan de naçe. U loma jî ez nêzîkî berhemên giran nabim. Lê dema min ev pirtîika we xwend, mîna ku hundurê dilê min be fi min bi xwe ew (\*) Karmendê İstesonê: // «Çîrokên Biyelkîn», navê çîrokek Pûşkîn e. WW

95

nivisandi be. Hertişt hûr hiir hatiye nigartin. Nola ku niviskar

dUê min vaca kiriye û wusa kat kiriye. A berhemeke wusa ye! Û bi zimanekî asan e jî, ewqas asan e ku ez jî dikanim binivîsînim. Çima nikani bim? Ew hemfi tiştên ku di pirtûkê de nivîsandî, ez bi xwe jî hîs dikim. Ez bi xwe jî ketime rewşa vî Samson Vyrînê reben. Û di nav me de jî gelek Samson Vyrînê dilperitî hene! Di vê berhemê de hertişt ewqas xweş hatiye raxistin ku! Dema min xwend ku gunehkar her xwe daye ber vexwarinê, çavên min tije hêsiir biîn. Rebeno, heta ku ji hiş de bikeve ii hertiştî ji bîr bike vedbcwe, kurkê xwe li xwe dipêçe îî heta êvarê radikeve, her gava ku berxika xwe ya wendabfiyî keça xwe Dunyaşayê bi bîr tîne, dbcwaze bi dilo-pên hêsiiran bêhna xwe fere bike ii bi deng digirî, dûre bi piyê kurkê xwe î gemarî hêsiirên xwe paqij dike. Natoriyeke ewqas rastîn e ku! Bixwînin, hfin ê bi xwe jî bibînin. Jiyaneke rastîn fi jîndar e. Ev yên ha ez bi çavên xwe dibînim. Kesên weha U dora me gelek in. Serqisê, Tereza... em zêde dfir neçin. A ew karmendê me î reben jî yekî wek Samson Vyrîn e, tenê navê wî Gorşkov e.

Lê biiyer her yek e, dako, dikane di serê herkesî de were, were serê min ii we jî. Kontekî ku di kuça Nevskîyê de an jî li Nevakayê(\*) dijî, biiyereke weha dikane di serê wî de jî were. Tcnê jiyana yekî weha bi awakî din e, cU û bergên wa xweşik û ji malmezinan e. Lê ew jî Samson e. Loma tiştêkî weha dikane di serê min de jî ii di serê wî de jî were. Ev tişt a wusa ye, dako. Ango hiîn jî dixwazin me bihêlin fi biçin, ne wusa? Ev yeka ê ji bo min bibe bextreşiyê giran, Varenka. Hfin ê xwe jî fi min jî bêşînin, berxika min. Horiya min, ji bona Xwedê van ramanên vala ji serê xwe bavêjin fi min jî wusa nerihet ne-

kin! Hiin hîn nola rebeneke çêla çfikekê ne, we ew hêz nîne  
(\* ) Nevaka: Li Petersbûrga kevn ciyê herî bi rûmet e. WW  
96

ku hfin bikani bin xwe xwedî bikin ii li hemberî bêbextan U  
ber xwe bidin. Na, Varenka, liîşê xwe bidine serê xwe fi dev ji  
van tiştan berdin. Guh nedin şîret û gotinên vala. Wê pirtûka  
xwe jî careke din fi bi baldarî bixwînin, ew ê bi kêrî we bê.  
Ji Ratazyayev re min çêlî «Karmendê îstesonê» kir. Wî jî  
digot, wexta pirtfikên weha derbas bûye, anuha rfimeta pirtfi-  
kên bi wêne bilindtir e fi pirtiikên weha bêtir têne xwencUnê.  
Ya rastî, baş têngêhîştîm ku ew dbcwaze çi bibêje, lê dûre  
pesnê Pûşkîn da î got: ew niviskarekî hêja ye, rûmeta Ûrista-  
na pîrozwer bUind kiriye, li ser wa gelek tiştên cUn jî got. Belê,  
gelek baş e, Varenka, gelek. Guhdariya ^etên min bikin û  
hûn wê pirtfikê bi baldarî careke din bixwînin! Bi vê yekê hfin  
ê dUê pîremêrekî jî xweş bikin. Wê çaxê jî bêguman Xwedê ê  
li ruyê we mêze bike û ew ê daxwaza dUê we pêk bîne.

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

6ê Havina Navin

Makar Alekseyevaçê giranbuha!

Fedorayê îro ji min re panzdeh rûbU hanîn. Wexta ku min  
sê rûbU dane wê, rebenê ewqas kêfxweş bfi ku! Ez vê nameyê  
pir zfi ji we re dinivisînim. Anuha ez xerîk im ku ji we re êle-  
gekî bidirûm. Ji qumaşekî zer î bi kulflkên hfirik fi pir xwe-  
şkok e. Ez ji we re pirtûkeke çîrokan bi rê dikim. Min ji wan  
çendek xwendin. Yeke bi navê Palto(\*) heye, bi taybetî jî hfin

wê bbcwînin. Hfin pêşniyar dikin ku em bi hev re biçin tiyat-  
(\*) Palto: Navê Çîrokek Gogol e ku rebeniya karmendên Pe-  
tersbûrga wê demê dide xuyakirin. WW

97

royê, lê ma gelek buha nabe? Ma nabe ku em bUêtan ji bo  
paradiyê(\*) bibirin? Ji zû de ye ez ne çûme tiyatroyê. Tew ca-  
ra dawîn jî nayê bîra min bê kengî bû. Ez ditirsim ku ev bex-  
tiyariya me ê pir buha be. Fedora jî serê xwe dihejîne û  
dibêje, hfin ji kanebfina xwe zêdetir difirin. Ya rastî, min jî  
hay ji vê yekê heye. Ma we, tenê ji bo xatirê min hindik perên  
xwe rijandin! Dûrî van derina, bUa tiştê di serê we de neyê,  
dostê min! Ji xwe Fedorayê qal kir ku ji bo perê kirê navana  
we fi xwediya xênî jî ne xweş e. Ez di ber we de hustuxwar im.  
De bi xatirê we, min karekî piçîik heye, wexta min teng e. Ez  
kordela kofiya xwe diguherîim.

VD

NOT: Ku bi rastî jî em biçine tiyatroyê, ez dibêjim ez ê ko-  
fiya xwe ya nû fi pelerînê(\*\*) xwe yê reş U xwe bikim. Niza-  
nim ew ê li min were, an ne?

7ê Havîna Navîn

Varvara Alekseyevna giranbuha.

Ez ê dîsa vegerim ser axaftina me ya doyan. Di wexta xwe  
de, dunya ne li ser guhê min jî bfi. DUê nun kete keçikek şa-  
noger. Şev fi ro ez bi vê evîndariyê biim. Ne derew e ku ez bi-  
bêjim, min ew keçUca tew ne dîtiye jî. Ji xwe tiştê seyr jî ev e.  
Carekê tenê ez çim tiyatroyê ii wusa min jê hez ku-. Li kêleka  
mala ku ez tê de dimam, pênc xortên pêxas jî di malekê de

(\*) Paradî: Di avahiya tiyatroyê de balkona henbilind e. WW

(\*\*) Pelerîn: Ji fransî tê: Mantilye. Sermilkek ku ji postên bi pirç, hevrişm an jî ji paç û weslikên wekîdin tê hûnandin ku bêtirjin davêjine sermilênxwe. WW

98

diman. Danûsitandinên min bi wan re hebû ii bêja daxwaza min be jî, hevaltiya min û wan bi wan re çêbû. Lê dîsa jî cU hevaltiya xwe û wan de ez bi pîvan bîm. Ji bo ku min jî yekî wek xwe bibînin, ez diketim cira wan û min xwe weke wan dikir. Hertim çêlî vê keçika şanoger dikirin û H ser wê cUpeyvîn. Her şev (Li gel ku nanê zikê wan jî tune bfi.) hemfi hevalbend bi hev diketin ii diçûn paradiyê.

Ji bo wê şanogerê weke şêtan çepik lêcUdan, bi qêrîn gazî wê dikirin fi ew dîsa derdbdstin sahnê. Bi şev jî xew ne cUkiria karê xwe û ne dihiştin ez jî rakevim; heta sibê her H ser wê dipeyvîn fi her yekî ew bi Glaşa xwe dinavand. Hemû bû bûn evîndarê wê fi agirê dUê hemfiyan jî ji bo wê hildavêt. Ez bi xwe jî zfi bi ber bayê wan ketim. Lê di wan deman de ez hîn xort û xwîngerm bûm. Ez bi xwe jî nizanim bê çawa bfi, lê şevê di paradiyê de, di rêza çaran de min xwe di nava wan de dît. Kujê perdê tenê bi min ve xuya cUkir, lê min (iikanî bû hertişt bibihîsiya. Bi rastî jî keçika şanoger xwecUyê dengê xweş bfi, mîna dengê bilbUekê zirav fi zelal bfi. Me hemûyan wusa H çepikan dbdst ii em wusa diqêriyan ku, hincUk ma bfi xelkê em hemû jî ji tiyatroyê bavêtana der. Ji xwe ji me yek havêtin der. Bi sergêjiyeke wusa min xwe gjhande malê ku ez nikanim bi lêv bikim. Di bêrîka min de bi teva^ rûbUekî min

tenê ma bû fi ji bo girtina perê mehana min, hîn deh roj ma biin. Lê ma hfin dizanin bê min dfire çi kir? Roja cUn, beriya ku ez biçime ser kar, ez çfim dikana parfumfiroşeke fransî, min bi tevayiyê wî perê xwe lewante û sabfinên bi bîn kirîn. Lê min bi xwe jî nizanî bfi ku çawa bû fi ev tişt hat ser hişê min. Min xwe ji xwarin fi vexwarinê kir ii ez diçfim H pêş pencera mala wê digeriyam. Keçik di avahiyeke Nevskiyê de, cU qatê çaran de dima. Ez dihatim mal, min hinekî westa xwe (U-girt û tenê ji bo ku ez H pêş pencera wê bigerim, min dîsa berê xwe dida Nevskiyê. Herweha min rasterast meh fi nîveke

99

xwe da î ez U pey geriyam. Bi vî awayî jî ne ma. Car bi car min fayton kirê fikir fi ez di ber mala wê re derbas dibûm. Wek gêjekî min hemfi perên xwe da ser fi ez ketim binê deynan jî. Lê diire, dfire ez jê westiyam û ev evîna U min sar bfi. Belê, dako, hfin bi xwe jî dibînin ku keçeke şanoger, merivekî şerefmend dike çi rewşê! Gerçî di wan deman de ez jî xort û xwîngerm bfim, lê...

M.D

8ê Havina Navin

Xatûnxana min, Varvara Alekseyevna!

Pirtfika ku we di şeşê vê mehê de ji min re şand, ez ê ji we re bi şfin de bişînim fi ez dixwazim ji we re hinek tiştan kat bikim. Tişteki pir xirab e ku hûn, min di rewşeke woisa dijwar de dihêlin, dako. Bi destfira we ez bidime zanîn ku; Xwedê ji bo her merivekî rêyek daye ber. Hinek xwediyê apoletên generaliyê ne, hinek karmendên destê şeşan e. Hinek fermanê

didin, hinek jî bêdeng ii bi tirs vê fermanê bi cî tînin. Ev tiştên ha li gor jîr ii zîrekiya meriv hatine damezirandin. Jîr û zîrekî jî dayîneke Xwedê ye.

Serqisê ev nêzîkî sî salan e ku ez karmendiyê dikim. Bê west fi bê rawestan min vatiniya xwe ji dUiican bi cî hanîye. Min serxweşî nc kiriye karê xwe ii heta roja îroyîn jî ez ne biî-me gungehkarê tevliheviyekê. Lê wek hemwelatîyekî, ez bi çavên xwe jî kêmasiyên xwe dibînim fi dizanim aliyên min yên baş jî hene. Amîrên min qedrê min dizanin û Ekselans bi xwe jî ji min xweş in. Gerçî heta nuha bi awayekî berbiçav ne daye xuyakirin ku ji min xweş in, lê ez dizanim ew ji min razî ne. Destnivisa min gelekî xweşik fi xwendebare e, ne hfir fi ne jî pir 100

gir e, bêtir rengên tîpên îtalîkî dide, lê ez bawer im stUek e kêfxweşî e. Di nav me de bi xweşikiya destnivisa xwe, îvan Prokovyevîç tenê dikane wusa baş binivise. Sal li min buhurîn û porê min gewr bû, lê nayê bîra min ku min gunehkariyeke wusa mezui kiri be. Lê, ma kesekî bêguneh heye? Herkesî gunehkarî kiriye, fi hiin bi xwe jî gunehkar in, dako! Lê min çew^iyeke wusa mezin ne kiriye, bi tevgerên xwe ez U dijî rêdarê derneketime û li ber asê ne bfime. Xebateke min ya U hemberî rêkiipêkiya gelemperî jî ne bûye ii bi gunehkariyeke weha jî ne hatime arihandinê. U kesek nîkane ji min re bibêje, te tiştêkî weha kiriye. Li ser vê yekê, tew carekê nîşaneke piçfîk jî dane min, lê ka bi kêrî çî tê? Ev hemû tiştên ha diviya bfi we ji berê de bizanî biîya. Diviya bû wî (\*) jî biianî biîya. Mafir ku wî niviskarî kire karê xwe fi riinişt ev çîroka nivi-

sand, diviya bii wî hertişt bizanî biiya. Na, Varenka, min ev tişta ji we ne dipa, dako! Nemaze jî ji we, min tişteki weha tew ne dipa!

Ev çi ye! Ma meriv ê êdî di quncikekî (Ev quncika çawa dibe bUa bibe.) xwe de jî ji xwe re bi rihetî nejîn, bêja ku ji mir^ka kesî re bibêje kiş, haydarê tirsaxwedê û di halê xwe de çima meriv nikani be bijî? Çima meriv pozê xwe têxin deriyê mala yekî fi binêrin ka êlegekî wî yê baş heye, ka bi têra xwe wî kincên binî hene, ka potînên wî çawa ne, binê wan di çi rewşê de ne, xwarin fi vexwarina wî çawa ye, çi paknivisiyê dike? Ma çi pêwîst dike ku ev hemû tiştên ha bête zanîn? Serqisê, dema ez di peyarê de diçim, ji bo ku potînên min kevn nebin, li ciyên xirab ez li ser bêçiyên dimeşim. Dibe ku destê merivekî teng e û perên wî jî tune ku çayê vexwe. Ka çi pêwîst dike ku meriv viya dinivisîne? Ma pêwîst e ku herkes çayê

(\*) Mebesta U vir Gogol e. Devû^kîne reben li dilêxwe digirê ku Gogol ev çîroka ha li ser wî nivisandiye. WW

vexwe! Ka min kengî U pariyê devê xeUcê mêze kiriye ku çi cUcfin? Ka min tinazên weha bi kê kiriye? Na, dako, na... Kesên ku têkilî min nebin, çima ez wan bêşînim?

A fermo ji we re nimûneyeke din jî, Varvara Alekseyevna! Bê west ii bê rawestan kar dikî, amîrên te ji te xweş fi kêfxweş dibin, (Dibe ku neyête xuyakirin, lê xweş û kêfxweş dibin.) lê tu dinêrî yek radibe bê sedem tinazên xwe bi te dike. Bêguman  
niviskar



dikanin  
hertim  
tişteki nî

U  
hev werîne  
û ji

kêfxweşiyê xewê H xwendevanan birevîne. Serqisê ew kî be jî dema ku lingên xwe di cotek potînên nû de bibîne, ew ê ji kêfxweşiyê bifire. Ev tişteki rast e, lewra ez bi xwe jî vê yekê jiyame. Wexta meriv lingên xwe di cotek potînên xweşik de dibîne, meriv pê pozbilind dibe. Ev beşên çîrokê rast hatine nivisîn. Lê dîsa jî hişê min di ber de naçe ku çawa ew Fedor Fedoroviçê ku biiye lehengê çîrokê, bala xwe ne daye ser pirtifikê fi li hemberî van çilkan xwe ne parastiye.

Gerçî ew jî yekî ji wan dagêranên nû ye fi wexta wî were ew ê jî bike birebir. Çima neke birebir? Dema ku pêwîst be, çima dagêranek di ser karmendên xwe de neke birebir! Carina meriv dibê qeyê cw ji kêf fi quretiya xwe vî tiştî dîkin, lê ne xem e, ew jî pêwîst e ii bila bikin! Divê darê zorê jî hebe, lewra (Bila peyv di navîna me de bimîne, Varenka.) heta ku U serê me karmendan nexînin, em kar nakin. Heryek dixwaze ji xwe re ciyekî peyda bike û tenê pê: Ez karmendê filan ciyî me, bibêje ii pê xwe mezin nîşan bide. Ji ber ku di karmendiyê de apoletên cuda cuda hene, loma gefxwarin ii arihandin jî li gor van apoletan têne guhertin. Ev tişteki normal e fi dunya jî li ser vî bingehî ava biiye, dako. Herweha herkes li piçîktirê xwe gefan dbcwe, wan dêşîne û pê meziniya xwe nîşan dide. Ji xwe bêyî van çareseriyên weha jî, ne dunya fi ne jî

rêkiîpêkî ê hebfiya. Bi rastî jî ez têngêhîjim ku H hemberî vê linazkirinê Fedor Fedoroviç çawa bêdeng sekiniye.

102

Çima ev hemû tiştên ha têne nivisandin? Ka bi kêrî çî têt?  
Na xwe ji xwendevanên pirtfikê yek ê rabe ji min re paltoyekî bide çêkirin, an ew ê ji min re cotek potînên nii bikire? Na, Varenka, xwendevan viya dixwîne û dûre jî dumahîka wê dixwaze. Carina meriv dixwaze xwe vekişîne quncikekî ii xwe ji hertiştî veşêre, ji tirsê ku gelacî ê bête kirin, meriv newêre pozê xwe jî dirêjî derve bike. Lewra ew dipên û dixwazin ku tişteki merivan bibînin fi pê tinazên xwe bikin. Lê meriv ê hew carekê bibîne ku bi jiyana xwe ya taybetî î civakî biiye mijara edebiyatê, hemii hatiye nivisandin, çap biiye, hatiye xwendin, bûye pêkenîn ii rexne jî lê hatiye girtin! Lehengê ku hatiye nîgartin ewqas li meriv dişibe ku, ji ber vê yekê meriv bi xwe jî êdî newêre derkeve kuçê. Meriv ê tavilê were naskirin. Bi kêmanî pêleke dUovaniyê li niviskar rabîiya û dawîya çîrokê bi xweşî biqedanda. Serqisê, dema ku perçên kaxezan di ser serê karmendê lehengê çîrokê de têtê rijandin, diviya bû niviskar weha bigota: Lê ev karmendê reben merivekî şerefmend, hemwelatîyekî dilpak bû, li hemberî wî ev tevgerên hevalên wî tişteki naxoş e, guhdariya amîrên xwe dikir, (Dikanî bû bi nîmiîneyekê ev raber bida.) xirabîya kesî ne dbcwest, bawerîya wî bi Xwedê hebû û dema ku mir jî (Ku niviskar pir bbcwaze ew bimire.) gelek kes li dî wî girîyan. Lê baştir bû ku nehiştê ew bimire. Bêyî ku paltoyê rebeno bête diyîn ii Fedora Fedoroviç, ango dbcwazim bibêjim... Ew generalê ku anu-

ha  
baştir  
bi  
rewşa  
karmend  
dizane,  
diviya  
bfi  
ew  
banî

nivistana xwe bikira, bihişta cw xwe bi pêş bixîne ii perên mehana wî jî zêde bikira. Wê çaxê meriv ê bidîta bê çêyî û xirabî çawa ciyê xwe dibîne. Hevalên wî karmendên reben jî, ew ê têbigêştana ku ew tevgerên wan nc tişteki baş bfi. Ku ez bfiyama, min ê dawiya çîrokê bi vî awa>a biqedanda. De ka çi balkêşanî fi xweşiya vê çîrokê heye? Tenê ji vê jiyana me ya rojane, nimfineyek bêrfimet e û ewqas. Çawa hat hişê we ku

103

hûn pirtîikeke weha ji min re bişînin, berxika min? Ev pirtfika ha bi firqiizî hatiye nivisandin, Varenka, pir baş xuyaye ku ne tişteki rast e. Lewra dfirî aqilan e ku karmendekî wusa hebe. Na, Varenka, ez ê gilî bikim, ez ê bi awayekî fermî gilî bikim. Hurmetkarê we  
Makar Devûşkîn  
27ê Havina Navîn  
Makar Alekseyevîçê giramîdar!  
Ev bûyera davnn û nameyên we ez tirsandim, serê min tev-

lihev kir ii ez mam behitî. Lê piştî katkirina Fedorayê hertişt zelal bû. Hfin çima wusa ji nişka ve bêhêvî dibin ii xwe U ser devê kendalê asêgehê dibînin, Makar Alekseyevîç? Gotinên we têra xwe ez serwext ne kirim. Binêrin, hûn bi xwe jî dizanin bê ji bo girtina wî karê pêşniyarkirî, min tiştêkî çiqas baş kiriye ku min her daxwaza wa karî kiriye. Ji bUî viya, ev bûyera dawîn jî ez gelekî tirsandim. Hfin dinivisînin fi dibêjin, ji ber ku hfin ji min hez dikin, loma hûn rastiyê ji min vedişêrin. Ez di berê de jî dizanim ku li hemberî we deyndariya min mezin e. Ev yeka jî, dema we bi min da zanîn ku hfin ji bo tengerojên min di sandoqek ewle de peran berhev dikin, ez hîn wê çaxê têngêhiştî bûm. Lê anuha ez têngêhiştim ku di bêrîka we de pênc pere ne mane, bi rasthatinekê hûn bi xizaniya mm hesiyane ii tew di wan demên nexweşiya min de we kincên li navpiyê xwe jî firotine ii ji bo min xerc kirine. Anuha dema ku ez bi van tiştan dihesim, dikevim rewşeke wusa xirab ku nizanim bê ez ê êdî çawa bifikirim, çi bUcim. Ax, Makar Alekseyevîç! Piştî çêyiya dUovanî û mertiyê, diviya bii hûn rawestiyana ii we zêde perê xwe U avarê xerc nekira. We dos-

104

taniya di navbera me de birîndar kir, Makar Alekseyevaç. Lewra hfin li hemberî mm rast tevnegeriyan. Anuha dema ez êdî pê dizanim ku heta quruşê xwe yê dawîn, we ji bo xemlûxêz ii gera min daye û we ji min re şekir, bUêtên tiyatroyê û pirtfik kirîne; bi poşmaniyeke mezm hundurê min reş dibe. Lewra dema we ji min re tiştên diyariyê jî dikirîn, Xwedê dizane bê hfin di çi destengiyê de bûne. Lê wexta ku min ev

diyariyên we digirtin, ez U ser rewşa we ne difikirîm û di ber de hustuxwar ne dibûm. Ê ew hemfi tiştên ku we ji bona bex-tiyariya min kir, anuha ji min re bûye kaniya xem û kovanan ii ji biU poşmaniyeyeke dUêşîn tiştekan bi min re ne hiştiye.

Di van demên dawîn de haya min ji xemgîniya we hebû ii min jî bi bêhtengî dipa ku tiştekanî naxoş ê bibe. Lê rewşeke weha, min tew ne dipa. Ev ne karê aqUan e! Hûn çawa ketme rewşeke weha bêçare, Makar Alekseyevîç? Ewqas dost ii nasên ku bu te dizanin, ew ê anuha li ser te çî bifikirin, çî bibêjm? Hiin yên ku heta nuha bi şerefmendî, nefspiçfikî, dUpakî û bi tevgerên xwe yên baqilane, we dUê min fi yên gelek kesên cUn girtiye; çawa dibe ku hûn ji nişka ve dikevîne çewtiyeke woisa kambax, û çewtiyek ku li dijî xwiyê we ye? Dema min ji Fedorayê bihîst ku hiin li kuçê serxweş ketine fi poUs hiin hanîne malê, ew Xwedê tenê dizane bê ez ketim çî rewşê. Gerçî hfin çar rojan xuya ne biin ii ji viya min jî dipa ku tiştekanî nepayî qewumiye, lê dîsa jî dema min bihîst, ez di ciyê xwe de sipûsar bfim. Ca bifikirin, Makar Alekseyevîç, wexta ku amîrên we pê bihesin ka bi rastî jî hiin ji bo çî ne çîne ser karê xwe, ew ê çî bibêjin? Hîin dibêjin ku herkes bi we dikenin, bi pêwendiyên me dizanin ii cîranên we di galegalên xwe de peyvan

davêjine

min.

Lê

hfin

guh

nedine

wan,

Makar

Alekseyevîç, ji bona Xwedê bêhna xwe teng nekin! Bfiyera ku cU navana we fi wan efseran de derbas biîye, ez hustuxwar kirim. Tiştina ketine guhê min lê ez bi rastiya vê yekê nizanim.

105

Yek bi yek van hemû tiştan ji min re vekin û bibêjin ka çi ye. Hiin di nama xwe de dinivîsînii dibêjin; ji tirsê ku hûn ê hevaltiya min wenda bikin, loma we rastiya dUê xwe ji min re venekiriye. Di nexweşiya min de hûn dudilî biine ku hiin bi çi awayî bikani bin alîkariya min bikin. Ji bo ku hûn min neşîmn nexweşxanê û U malê li min binêrin, we hemû tiştên xwe firo-tine, heta gewriyê hfin ketine binê deynan û her roj jî hfin bi xwediya xaniyê xwe re bi pevçûnê bfin. We gelek xirab kiriye ku we ev hemî tiştên ha ji min veşartine. Lê anuha êdî ez bi hertiştî hesiyam. We nexwest hûn bidin ber pozê min ku ez biim sedemê vê rewşa we ya bextreş. Lê bi vê tevgera xwe, we xemgîniya min ewqasî din jî zêde kir. Ev hemî tiştên ha ez U hev gerandime ii nizanim ka çi bibêjim, Makar Alekseyevîç. Ax, dostê min! Bextreşî, nexweşiyeke têgerîn e. Merivên reben, merivên bextê wan reş divê ji hev diir bisekinin ku vê nexweşiyê zêde ji hev negirên. Ew jiyana we ya bêdeng fi bêdaxwaz, ez bîm sedemê wê ku heta nuha hûn tew pê ne jiya biin. Her gava ku ez van bi bîr tînim, dilê min teng dibe û ez tetirxanî dibim.

Anuha, çi bi serê we de hat ii we çawa biryara xwe da ku hiin têkevîne danfisitandineke weha, hemîyî yek bi yek ji min

re binivîsînin! Ku dest bide, dilê min xweş bikin! Ne ku ez vê yekê ji bo şerefa xwe ji we dbcwazim, ez ji bo hevaltî fi hezkirina ku tu carî ji dUê min dernakeve, ji we lava dikim. Bi xatirê we! Ez bêtewat li bendî bersîva we me. Li ser min, hûn tew baş ne fikirîne, Makar Alekseyevîç.

Hezkira weya dilsoz

Varvara Dobroselova

106

28ê Havîna Navîn

Varvara Alekseyevna min ya bêhempa!

Tiştê ku bû, êdî çfi. Lê piştî ku anuha hertişt dîsa hêdî hêdî li rewşa xwe ya berê vedigere, dbcwazim ji we re tişteki bibêjim, dako: Hiin xwe nerihet dikin ku ka xelk ê ji min re bibêjin çî. Varvara Alekseyevna, divê ez tavilê bi we bidime zanîn ku ez şerefa xwe di ser hertiştî re digirêm. Lê ez ji we re bibêjim, ew naxoşiyên ku bi serê min de hatin, amîrên min hay ji wan nîne ii ew ê pê nehesin jî. Herweha jî ew ê dîsa nola berê qedrê min bizani bin. Bila şika we ji vê yekê tune be. Lê tîrsa min ji tişteki tenê heye; û ew jî gelacî ye. Xwediya xaniyê me her dike qîreqîr. Lê anuha piştî ku min ew deh rûbilên we dayê fi pê hineki deynê xwe sivik kir, êdî nake birebir, lê dîsa jî bi pilepil e. Nerindiya yê mayî li min ne bfiye. Heta ku meriv devê xwe li ber wan xwar neke û ji wan peram deyn nexwaze, xirabiya wan jî nabe. Ê ez dbcwazim viya jî U gotinên xwe zêde bikim ii bibêjim ku hurmetkariya we ya U hemberî min, ji hertiştî giranbuhatir e ii di nava van ncirihetiyên de, ez jî xemgîniya xwe, tenê bi vê yekê belav dikim. Şikir ji Xwedê re

derb îî depresyonên pêşîn derbas biin. Ji ber vê rewşa min, we ez wek hevaleyê xapînok û egoîst ne dîtîm ii we ez gu-nehkar dernexistim. Ji ber ku min weke horiyeye xwe ya piçfîk ji we hez dikir îî bêyî we ez ê tetirxanî bibûyama, loma min kir ku ez we bixapînim. Lê anuha dîsa ez li karê xwe vegeriya me ii ji dilûcan kar dikim. Do, dema ez U ser rîya xwe di ber Yestavî îvanovîç re derbas bîm, tew peyvîkek jî ji devê wî derneket.

Min dil nîne ku ez ji we veşêrim, dako: Hustuxwariya min ya mezin, ew deynên min fi perîşaniya dolaba min ya kincan e. Lê xem nake, ji we lava dikim ku hûn ê jî xwe pê xemgîn nekin, dayika min! We ji min re nîv rûbîlekî din jî şandiye, lê 107

rasterast kezeba min peritand, Varenka. Ango ez ketime vê rewşê, ne wusa! Qaşo diviya bfi min ehmeqê pîr alîkariya horiyeye weke we bikira, lê ez dinêrim ku hfin sêwiya min ya reben alîkariya min dikin! Bi rastî jî gelek baş bfi ku Fedorayê pere peyda kirin. Heta nuha jî rîyeke destxistina peran H min venebfiye, dako. Ku hêviyeye peydakirina peran bi min ve xuya bike, ez ê ji we re binivîsînim. Lê ji hertîştî bêtir ez ji gelacî îî gotinan ditîrsim û bêhna min ji wan teng e. Vê gavê di xweşiyê de bimînin, horiya min! Ez destê we radimiisim û daxwaza saxiya we dikim. Min zêde wext nîne ku ez binivîsînim, lewra divê ez xwe bigêhînim ser karê xwe. Ez dbcwazim bi jîrî fi xebatkariya xwe kêmasiyên xwe veşêrim. Bfîyerên din



fi ew serûvena ku di navîna min û efseran de bû, ez ê bihêlim êvarê.

Hurmetkar û hezkirê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

29ê Havina Navin

Varenka, dayika min!

Ax, Varenka, Varenka! Vê carê jî gunehkariya we ye ii ev gunehkariya ê di we de bi cî bibe fi bimîne. We bi nama xwe hiş ii aqU ji serê min bir û hêvî H min şikand. Anuha dema ku ez bi seriyekî zelal destê xwe didim ser dUê xwe û hûr hiir lê diramim, wê çaxê têdigêhîjim ku heqê min heye, ji erdê heta asiman jî heqê min heye. Li vir, ne ku ez çêlî serfivena xwe ya beradayî dikim, (Bila dûrî min be, dako, dfirî min!) lê ez dbc-wazim bibêjim ku ez ji we hez dikim fi tew jî ne tişteki kêmaqilî ye ku ez ji we hez bUcim. Hiin tew bi tişteki jî nizanin, dako. Lê ku we bizanî bûya ev hezkirina min ji kuderê tê fi çi-108

ma divê ez ji we hez bikim, we ê weha negota. Gotinên we bêtirîn ber bi ramanekî baqilane ye, lê ez baş pê ewle me ku hfin di dilê xwe de bi awakî din difikirin.

Dayika min, ew bfiyerên ku di navîna min fi efseran de qewumîn, ez bi xwe ne dizanim ii ne jî baş tene bîra min. Divê hûn bizani bin ku wê çaxê ez di rewşeke pir hêrsbiiyî de bfim. Ca bifikirin ku rasterast mehekê ez di rewşeke perîşan de biim. Mîna ku ez bi tayê deziyekî xav bi hev ve ma bim, bêçaretiya min gêh^ti bii daraxeke bilind. Min ev rewşa xwe ya dijwar ji we vedişçU"t ii herweha ji malê jî, lê xwediya xaniyê

min kire birebir û pevçûn derxist. Gerçî min guh ne dida wê, heta ku jê dihat bila bikira birebir, jinika cadfîkar! Lê bi viya tenê jî ne ma. Ji hêlekê vc rezûî dikir û ji hêla din ve jî Xwedê dizane bê bi çi awayî pêwendiyên dostaniya me hîn biiye, di tevayiyê avahiyê de zimandirêjiya vî tiştî dikir. Ez ewqas nerihet bûm ku min guhên xwe dixctimand. Lê xelkê jî bi baldarî guhdariya wê dikirin. Ê anuha jî nizanim ku ez ê bi kuderê de birevim, dako.

A hemfi ev tiştên ha, ev kul fi xemên ha ez tetirxanî kirim. Mîna ku ev têr ne dikir, min ji Fedorayê jî tiştên nepayî bihîstin ku: Heşaşekî nerind hatiye mala we, bi pêşniyareke kambax hûn piçfîk xistine, hiin nerihet kirine ii bi gelek jî hûn nerihet kirine. Lewra dema ku ez xwe dbdm dewsa we, ez dizanim ku hiin çiqasî pê êşiyane. A wê çaxê hiş î aqil ji serê min çii û êdî min xwe ne girt, horiya min. Ji bo ku xwe bigêhînim mala wî bênamfisî, ez mîna şetekî ji hundur derketim, Varenka min. Min jî nizanî bû ku ez ê çi bikim. Lê çi dibe bila bibe, min ne dbcwest ku yek rabe ii horiya min piçîik bbdne. Xemgîniya min ne dihat pîvanê. Li derve jî şilî ii şepeliyeke wusa hebfi ku rê ne dida. Xemsariyê bi min girt, min kir ku ez bi şûn de vegerim, lê ez li kerê şeytên siwar bûm ii rastî Emelyan Îlîç î karmend hatim, bi gotineke rastir karmendê kevn.

109

lewra ew ji kar havêtin. Ez bi xwe jî nizanim bê ew anuha çi dike ii çawa debara xwe dike. Em bi hev re meşiyar. Dfire jî... Lê dev jê berdin, Varenka. Ma hfin ê rabin ji guhdariya hemfi nebaşiyên ku bi serê dostê we de hatiye, kêfxweş bibiti? Bi

kurtebirî: Şeva roja sisiyan, bi pîjkirina Emelyan ez jî rabfim çfim mala wî efserî. Min navnîşana wî ji dergevanê me girti bû. Mafir ku peyv hatiye ser peyvê, ez ji we re bibêjim, dako; dcma ku cv meriva hîn di xaniyê me de bû, xwîna min lê ne keliya bfi ii çavê min her li ser wî bfi. Lê anuha ez têdigêhîjim bê tiştê ku min dikir, ne tiştê baş bfi. Lewra dema ku ez çim mala wî, ez serxweş bfm. Ya rastî tew tiştê jî nayê bîra min, Varenka. Tenê ev tê bîra min ku U mala wî gelek efser hebûn. An jî serxweşiya xwe, min hertişt cot cot didît. Xwedê min bibexîşîne! Ê tew nayê bîra min, min çî jî digot. Tenê ez dizanim ku hêrsa şerefmendiyê bi min girti bû û her ez dipiyîm. Li ser vê yekê bi çepelê min girtin, ez ji hundur derkim ii ji pêlikan de jî gêrî xwarê kirim. Ê êdî hûn bi xwe dizanin bê min bi çî awayî xwe gihandiye malê, Varenka. A hemî ev e.

Ji ber van tiştên ku qewumîn, ez piçûk ketim û şerefa min şikiya. Lê kesek pê nizane, ji bû we kesek bi viya nizane. Ê herweha mîna ku ew biiyera tew ne qewumî be, ne wusa, Varenka? Ez bawer im em herdu jî bi ramanekî re ne. Sala çiyî ez rastî bûyereke weha hatim: Li ciyê karê me Aksentî Osîpoviç neheqî li Pyotr Petroviç kir. Lê wî ev tiştê bi dizî kir. Ew banî oda xedeman kir. Li wir çî hat ber devê wa jê re got, şerefa wî şikand ii ew piçûk xist. Lê wî ev tiştê bi kubarî kir. Di qelişa derî re min hertişt bi çavên xwe dît. Anuha bfiyîn fi ncbûyîna vê bûyerê jî yek e, lewra ji bilî min tu keseb" ne dît û min jî ji kesekî re ne gotiye. Mîna ku tew tiştê ne qewumî be, piştî vê bûyerê jî Pyotr Petrovaç û Aksentî Osîpoviç bi hev re weke berê ketin daniisitandinê. Pyotr Petroviç jî wek ku hûn

dizandin şerefmendekî diltenik e ii tew kesek jî bi vê bfiyerê ne hesand. Û herweha anuha sUavê U hev dikm fi destê hev dUeqînin.

Na, Varenka, min dU nîne ku ez xwe li hemberî we biparêzêm, ii ez newêrim li ser vê yekê têkevim heftiiheştê jî. Dizanîm, ez piçûk ketime, ya herî xirab jî min bawerîya xwe ya bi xwe, wenda kiriye. Çi bikim, xuyaye ev çarenîsa min e. Hûn jî dizandin ku meriv nikane ji çarenfîsa xwe birevin.

Çîroka xirabî û nerihetiyên ku bi serê min de hati bûn, va ye min hertişt ji we re ji seriiber ve kat kir, Varenka. Çîrokek wusa ye ku meriv dbcwaze bibêje, xwezika nehata nivisandin. Ez hinekî nerihet im, dako. Loma jîndariya pêjnên min li min wenda biiye. Li gel vê yekê dilsozî, hezkirin fi hurmeta xwe bi we Varvara Alekseyevnayê didime zanîn.

Xulamê we

Makar Devû^kîn

29ê Havîna Navîn

Makar Alekseyevîçê giranbuha!

Di xwendina herdu namên we de jî, êş îf tirseke seyr bi min girt. Binêrin, dostê min! Xwedê dizane hûn tişteki min vedişêrin fi loma hûn ji nerihetiyên xwe beşekî tenê ji min re dinivîsînin, an jî... bi rastî, namên we jî didine xuyakirin ku hfin hîn ne hatine ser xwe. Ji bona Xwedê werin ba me, îro werin! Gelekî bi rihetî werin û em bi hev re şîvê bbcwin.

Ez hîn jî nizamim bê li wir rewşa we çawa ye, navîna we fi xwediya xênî hinekî baş bfiye, an ne. Li ser van, hiin tew tişt-

kî nanivisînin ii hiin hertim jî di ser guhê xwe re davêjin. De  
vê gavê bi xatirê we, dostê min! Bê pirs û bê gotin divê hfin  
111

îro werin! Ya rastî, baştir bfi ku ji bo şîvê hûn hertim bihata-  
na ba me. Xwarina ku Fedora çêdike, meriv tUiyên xwe pê re  
dixwe. Di xweşiyê de bimînin!

Varvara Dobroselova

we

lê Havîna Paşin

Dayika min, Varvara Alekseyevna!

Ji ber wê fesala ku Xwedê daye we ii hfin bUcani bin li  
hemberî çeyiyê, çeyiyê bikin; kêfa we tê. Ez bi viya bawer di-  
kim fi ez bi dilpakîya dilê we î horiyar jî bawer dikun. Ne ku  
ez giliyê xwe dikim, lê divê hfin jî êdî çêU çarçfirî û destbela-  
viya min ya demên buhurî nekin. Tiştêkî ku bfiye û çûye, me-  
riv ê çî bikin? Ku hfin dbcwazin bibêjin ev gunehkarî ye, rast e  
ii ez vê yekê jî li xwe datînim. Lê tiştê ku min dêşîne, bihîstina  
ji devê we ye. Li dilê xwe negnin ku ez van gotinan dibêjim.  
Dilê min tijî kul fi kovan e, dako. Merivên reben ji çêbûna  
xwe de xwediyê kaprîsan e, fi dibe ku ev daxwazeke naturî be.  
Min berê jî ev tiştê hîs dikir ku merivekî xizan hertim dibdrçik  
e. Bi çavekî din li dunyayê dinêre. Dema ku di kuçê de rastî  
hinekan tê, mîna ku li ser wî tête peyivîn, rexnegiriya rewşa  
wî ya rebcn tête kirin, ew jî bi veniciqîn di bin çavan re H wan  
dinêre û bi dudilî guhên xwe li gotinên wan vedigirê. Gelo çî-  
ma ev merivê xizan wusa narîn e? Hîseke wusa lê radibe, mî-  
na ku ji her aliyê ve bala xelkê li ser wî ye. Rastiyek heye,

Varenka, ii herkes jî pê dizane ku: Rûmeta merivekî xizan bi qasî riimeta paçekî jî tune. Kî çi dibê bUa bibê, çi dinivisîne bila binivisîne, kesek rfimetê nîşanê rebenên weha nade. Belê, ev kesên ku ruyê kaxezan reş dikin û çiqas binivisînin jî, lê 112

rewşa rebenekî ê her weke xwe bimîne. Ji ber çi? Ji ber ku U gor niviskaran; bi her tiştên xwe ve divê der û hundurê merivên reben derkeve holê, di hebiina wan de quncikekî veşartî jî nemîne! Çend roj berê, Emelyan ji min re got ku H derekî ji bo wî hinek pere berhev kirine. Lê woisa kirine, mîna ku ev karê ha di binê kontroleke fermî de bête kirbi. Aya ew ketia gumanekê ku wan perên xwe U avarê dane wî? Ez bawer nakun. Lê wan ev perên xwe dan ku tenê xizaniya wî bi wa bidine xuyakirin. Di roja îro de babetê çêyiyê jî êdî bi awakî seyre, dako. Kî dizane, dibe ku berê jî wusa bii. An tew nizanin bê ev karê ha çawa dibe, an jî ew bi zanistiyêke hunermendane \a karî dikin. Ji herduyan yek e. Dibe ku we berê ev tiştan nizîmî bii, lê hîn bibin. Di warên din de ez ne xwediyê zanebûneke zêde me, lê di \a warî de bUa baweriya we bi min were.

Hûn ê bibêjin ku ev rebenê ha çawa bi van tiştan dizane fi weha dirame? Meriv ji azmayişên xwe dizane, dako! Serqisê, di çiyîna restaurantê de meriv rastî gelek efendiyan tîn ku di ber xwe de dikenin fi bi pilepil dibêjia: «Aya ev karmendê ku bi rewşa parsekekî, ew ê îro çi bbcwe! Ez ê sautê auxpapillotêsê bbcwim, lê ew, dibe ku zikê xwe bi girara rijî tenê dagirê.» Ma wî çi jê ye ku ez girara rijî dixwim? Bi rastî jî merivên

wusa hene fi tenê li ser tiştên weha diramin, Varenka. Li her deverê çavên van nerindan H ser merivan e ku bizani bin ka meriv di rêveçfina xwe de tevayiya binê lingê xwe didine erdê, an U ser bêçiyên dimeşin. Bi zar û zimanekî xweşikane dinivîsîn ku filan karmendê destê şeşan karmendê filan buroyê ye, cU potîna wa ya qetyayî re bêçiya wî ya tazî derketiye, enîşkên wa dnyane. Mîna ku havUekî dikin, radibin çap jî dikin. Ma we çî jê ye ku enîşkên min diriyane, merivên Xwedê! Ez ê nimûneyek naxoş bidim, lê U min biborin, Varenka. Di vî warî de şermokiya merivên reben, weke pêjnên şermokiya we ke-

113

çên berzewac e. Çawa ku hûn naxwazin li ber xelkê xwe tazî bikin, -li min biborin ku ez bi zimanekî naxoş dinivîsînim-merivekî xizan jî naxwaze ku yekî biyanî serê xwe di deriyê kozika wî re dirêjî hundur bike, pêwendiyên malbatî û rewşa jiyana wî bibîne. Tiştê ku ez pê êşiyam, ew xêrnexwazên ku bi navûdengê min lîstin, hfin jî bi wan re yek bûn, Varenka min! Îro ez di buroyê de wek kucUkekî hirçê, nola çêlçfikeke rûçikî min

xwe dabii ser hev û wusa bi tenê rûniştî bîm ku ji şermesariyê ketim binê erdê. Min gelekî şerm kir, Varenka. Ku enîşkên meriv di ciyên qetyayî re xuya bikin, bişkovên meriv li ser tayekî bimîne fi U ba bikevin, ma çawa meriv ê nerihet nebe! U ji xirabî re jî îro bi her awaja derbederiya min diyar bfi ii herweha bivê nevê meriv ê xwînsariya xwe wenda bike. Stepan Karlovîç bi xwe îro di warê karekî de bi min re her dipeyî\ a fi dipeyivî. Ê mîna ku wusa hati be ber devê wa, ji

nişka ve «Ax, Makar Alekseyevîç, çiqas heyf e ku...» got ii bêyî ku tiştên di dilê xwe de bibêje, sekinî. Wî ne got, lê ez têgêhîştim ii ez heta serê xwe yê rfit soromoro bfim. Gerçê ne tişteki ewqas girîng e, lê dîsa jî tiştên naxoş têne hişê meriv û meriv pê nerihet dibe. Ez tirsiyam ku tiştina ber bi guhên wan keti bin. Xwedê neke! Ma ew ê ji kuderê bizani bin? Ya rastî şika min ji yekî heye. Bi van dilkevîrên ha bawerî nabe! Tawilê merivan didin dest. Ew dikanin jiyana meriv ya arizî jî bi pênc peran bifiroşin. Tişteki pîrozwer li ba wan tune.

Ez dizanim bê kê ev lîstika H serê min hûnaye. Ratazyayev ev tişt kiriyê. Li ciyê karê me naseki wî heye. Wusa xuyaye di galegalên xwe de gelek tişt lê zêde kiriyê ii hertişt jê re gotiyê. Dibc ku tew di buroya xwe de zimandirêjî kiriyê ii ev tişt heta ciyê karê me hatiye. Ji xwe H malê kesê ku pê nizani be tune ii min bi çavên xwe dîtiye ku gelek caran pencera we nîşanî hev didin. Do, dema ku ez ji bo şîvê hatim ba we, ji her pencereyekê seriyek dirêjî derve bfi bû. Xwediya xaniyê me jî

«şeytan bi ber bayê pitikê dikeve!...» got fi paşîngê jî ji bo we peyvikek naxoş bi lêv kir. Lê ev tiştên ha, U ber wan dilreşiyên Ratazyayev tew ne tişteki e! Wî bi xwe gotiyê ku ew ê H ser me herduyan pirtfikekê binivisîne. Min ev, ji devê dUpakeki di xaniyê me de bihîst. Ez êdî nikanim U ser tişteki biramim fi nizanim bê ez ê çi bikim. Gunehkariya ku me U hemberî Xwedê kiriyê, êdî bi kêrî tişteki jî nayê ku em veşêrin, horiya min!

Ji bo ku bêhna min teng nebe, we ê ji min re pirtûkek bi-



şanda. Dev jê berdin, dayika min! Ji xwe ma pirtfik çî ye ku!  
Çî vir fi derewên ku li ser merivan têne gotin, di pirtfikê de  
berhev dibin. Roman jî tiştên vikfivala ne. Hatuie nivisandin  
ku merivên ehmeq bixwînin ii pê cUlê xwe xweş bikin. Ji min  
bauer bikin, dako. Lewra ez gelekî jiyame fi min dîtiye. Ew ê  
hertim ji we re çêU Shakespearekî bikin: «Di lîteraturê de  
Shakespeare weha ye ii weha ye...» bibêjin fi serê we bikine  
weke kundir. Lê Shakespeareyê wan jî tişteki vala ye, hemû jî  
peyvên piîç û vala ne, vir û derew in!

Makar Devûşkîne

we

2ê Havina Paşin

Berêz Makar Alekseyevîç!

Tew bêhna xwe teng nekin! Bi aUkariya Xwedê hertişt ê  
baş bibe. Fedorayê ji bo xwe jî fi ji bo min jî gelek kar peyda  
kiriye fi em bi kêf karê xwe cUkin. Hêvîdar im em ê bikani bin  
rewşê serast bikin. Fedora, ji Anna Fedorovnayê dikeve gu-  
manê ku di van nerihetiyên min yên dawîn de tiliya wê hebe.  
Lê êdî ez tew guhê xwe nadim van tiştan. Ez jî nizamim bê ji  
115

çî ye, lê ez îro gelekî kêfxweş un. Hfin didme zanîn ku hûn  
dbcwazin hinek pere deyn bUcin. Xwedê bisitnîne! Dfire daja-  
na wî deynê jî heye. Ya baştirîn ew e ku hfin xwe nêzîkî me  
bikin. Hatfiçiya xwe ya ba me zêdetu" bUcin ii guh nedin xwe-  
diya xaniyê xwe! Ku em werin ser wan neyar û xêrnexwazên  
dîn, ez pir baş dizanim ku hûn di ber ramanên bêbingeh de  
serê xwe dêşînin, Makar Alekseyevîç! Min cara berê jî ji we

re goti bii ku ev stUa we tew ne rast e. Anuha bi xatirê we, ji sedî sed divê hûn werin fi ez we dipê.

V.D'ya

we

3ê Havina Paşin

Horiya min, Varvara Alekseyevna!

Ez lez dikim fi dbcwazim zfi bi we bidime zanîn ku tîrêjên hêviyên nû li min rabiine, berxika min. Hûn ji min re dinivisîn nin û dibêjin ku divê ez nekevim binê deynan. Ma bêyî deynkirinê ez ê çawa xwe serast bikim, berxika min? Ji xwe rewşa min xirab e. Meriv nizane, te hew mêze kir ku tiştê bi serê we de jî hat. Lewra hfin hişk û jar in. Ji ber serwextiya vê yekê ez ji we re dinivisînim ku divê ez deyn bikim.

Hiîn guhdar bikin hîn ez ê ji we re çî bibêjim, Varvara Alekseyevna. Li ciyê kar, ez fi Emelyan îvanovîç em U kêleka hev riidinin. Lê ew Emelyanê ku hûn nas dikan, ev ne ew e. Ev jî weke min karmendê destê şeşan e. Di buroyê de em herdu jî ji hemiiyan bisaltir fi kevntir in. Xêrxwazekî dUpak e û ne merivekî egoîst e. Şorgermiya wa tune û hinekî jî kû\ a ye. Lê gelekî jîr e. Destnivisa vn rasterast weke stîla îngUîz e. Ku meriv rastiye bibêje, destnivisa vn'fi ya min ne xirabtir e. Me-  
116

rivekî maqûl e! Heta nuha nêzîkayiyê me ya wusa zêde tune bfi. Weke herkesî me jî sUav li hev fikir ii xatir ji hev dbcwest. Carina dema ku pêwîstiya min ji kêrê hebfiya, min ji wî dixwest ii digot: «Emelyan îvanovîç, ji kerema xwe re kêra xwe bidine min.» Bi kurtî ji bilî çend peyvikên ku meriv ji pê-

wistiyê bi kar tînin, pêwendiyê me bi hev re tune bfi. îro hat ii ji min re got: «Hûn çima wusa kwîr kwor diramin, Markar Alekseyevîç?» Min nêhirî ku ji dilpakiya xwe dipirse û loma min jî jê re hundurê xwe vala kir fi got: «Weha ye fi weha ye, Emelyan îvanovîç...» Lê min hertişt jê re kat ne kir. Xwedê neke! Ji xwe ez newêrim çêlî hertiştî jî bikim. Tenê min rewşa destengiya xwe fi tiştên weha jê re bi lêv kir. Emelyan îvanovîç li min vegerand ii got: «Wê çaxê, divê hiîn ji xwe re deyn bikin, bavikê min. Serqisê, hfin ê bikani bin ji Pyotr Petrovîç deyn bixwazin. Min jî jê deyn kiri bû. Bi faîzê dide, lê faîza ku ew dixwaze, ne zêde ye.»

Bi bihîstina van gotinan re pêjnên hêviyekê li min rabfin, Varenka. Xwe bi xwe fikirîm fi min di dilê xwe de got: «Dibe ku Xwedê dilovaniya xwe bi ber dilê Pyotr Petrovîç bbce û ew min destvala venegerîne.» Min ji xwe re hesabek jî çêkiri bfi ku ez ê wan peran ji çî re xcrc bikim: Min ê deynê xwcdiya xaniyê xwe bida, min ê alîkariya we bikira. Min ê cilûberg li , xwe bida çêkirin. Şerm e, di nav van kincên kevn de mîna ku di nav dirikan de bim, ez şerm dikim, ji xwe heval jî tinazên xwe bi min dikin. Xwedê bi wan re be! Carina ekselans di ber me re derbas dibe. Tirs min ew e ku carekê li min binêre û bala xwe bide van kincên min! Ew bi xwe rêkûpêkî fi xweşik-biiyînê di ser hertiştî re digirê. Dibe ku tiştêkî nebêje, lê ez jî şermesariyê tikevim binê erdê. Piştî ku ez li ser van hemî tiştan ramiyam, min şermesariya xwe di tiirekî de veşart fi min berê xwe da cem Pyotr Petrovîç. Bi dilpekiyê bêtewat, bi hêviyê mezin fi bi awakî nîvmirî min xwe gihande wî.

Êdî hfin bi xwe bifikirin bê bi çi awayî qediya, Varenka. Karê wî hebii fi bi Fedosey îvano\aç re dipeyvî. Hêdîka ez nêzîkî wî çûm, min bi piyê wî girt kişand fi got: «Pyotr Petrovîç, Pyotr Petrovîç!...» Serê xwe zivirand û li min nêhirî, min pê da zanîn ku destê min teng e, pêwastiya min heye, bi qasî sîrfibilî bidine min... hwd. Mîna ku di destpêkê de tenegehîştî be. Lê piştî ku min hertişt jê re got ii ew serwext kir, bêyî ku gotinekî bike, keniya. Lê dema min daxwaza xwe ducar kir, wî ji min pirsî û got: «Ma tiştêkî we î ku hfin bi girûganî daynin, heye?» Di peyvîna xwe de U min ne dinêrî, xwe di ser kaxeza ber xwe de xwar kiri bfi ii her dinivisî. Ez piçekî gêjokî biim fi dfire min gotê: «Na, Pyotr Petrovîç, tiştêkî min î girûganiyê tune. Lê çer ku ez mehana xwe bistînim, ji sedî sed ez ê deynê xwe bidim. Ez ê viya weke vatiniya xwe ya herî pêşîn bizani bim. Di wê gavê de yekî banî wî kir. Heta ku ew bi şûn de hat, ez li wir sekinîm. Dema ku hat jî, mîna ku tew min nabîne dest bi tfijkirina pênuşa xwe kir. Min careke din pê da zanîn ka bê ew ê bi awayekî tiştêkî bi deyn bide min, an ne. Mîna ku nexwaze bibihîse dengê xwe ne kir. Rikebariya min jî bi min girt, min kir ku ez careke dawîn jê re bibêjim û min piyê wî hejand. Mîna ku bixwaze tiştêkî bibêje, lê ne got, zûziika pênuşa xwe tfij kir ii dîsa dest bi nivisandina xwe kir. Ez ji xwe re bi şiin de vekîşiyam û min da ser riya xwe. Bmêrin hfin dibînin, dako, dibe ku ev merivên ha bêrfimet bin, lê hemfi jî qure ii qapiz in. Ji pozpilindiya wan, meriv nikane nêzîkî wan biçe, Varenka! Ji xwe ji ber vê yekê ye ku ez jî ji we re dinivisînim.

Emelyan îvanovîç jî kenîya fi serê xwe hejand. Çi bike, bi kêmanî hêviyek da min, mala wî ava! Emelyan îvano\aç merivekî maqfil e. Soz da min ku ew ê min bi ciwamêrekî bide naskirinê. Mala wa li kuça Vîborskayayê ye. Ew jî bi faîzê deyndide. Karmendekî destê çardehan e. Emelyan îvanovîç gelekî

118

pê ewle ye ku ew ê bide. Ez ê sibê rabim ii biçim ba wî ka bê çi dibe, horiya min. Bê pere nabe, ku nede, xwediya xaniyê min ê min ji xênî derbbce. Xwaruiê jî nade min. Potînên min jî ji hev ketine, dako. Hemfi bişkovên paltoyê min ketine. Ma çi kêmasiyên min tune ku!... Lê ku tew ji amîrên me yek hay ji vê rewşa min bibe? Mabdrabî ye, Varenka, mabdrabiyeke rastîne!

Makar Devûşkîn

4ê Havîna Paşîn

Makar Alekseyevîçê xoşewîst!

Ji bona Xwedê, Makar Alekseyevîç, heta ku ji destê we tê zû ji deverekê hinek pere deyn bikin. Ya rastî ku rewşa min gelekî ne xirab bûya, di vê destengiya we de min ê tew daxwaza alîkariyê ji we nekira. Êdî ne gengaz e ku em di vî xaniyê de bimînin. Tiştên ewqas xirab bi serê min de hatin ku hûn nizanin bê ez çiqasî dilpekî ii xemgîn im. Ca bifikirin, dostê min, vê sibê merivekî pîr, nenas fi bi berê sîngê xwe ve tije nîşan hate mala me. Ez tenegehîştîm bê ji me çi dîwest fi wusa matmayî mam. Wê çaxê jî Fedora ji bo karekî derketi bii bajêr. Mêrik ji min pirsî ka ez çawa dijîm, çi karî dikim. Bêyî ku bersivên pirsên xwe bipê, da zanîn ku ew, apê wî efserî ye ii

gelekî ji biraziyê xwe hêrs bfiye ku wî li hemberî me gclekî nerindî kiriye, di nav xelkê de em riswa kirine ii piçûk xistine. Dema ku li ser biraziyê xwe dipeyvî jî, gotinên wekc «naşî» «sersem» bi kar hanî fi ji min re got, ew ji dilfican amade ye ku min bigirê bin sitara xwe. Li min şîret kirin ku ez guhê xwe nedim gotinên xortên naşî. Diire li gotinên xwe zêde kir û da zanîn ku ew bi dilovaniya bavekî li min dinêre û ji bo her alî-  
119

kariyê ew amade ye. Ruyê min reng U xwe cUguherand, bi awakî matmayî min nizanî bfi ku ez ê çi bibêjim, fi min ne kir ku ez sipasiya wî jî bUcim. Bi vir fi wir de pîremêr hişkfirî bi destê min girt, gupa min mist da. Bi lêv kir ku ez gelekî xweşik im û ev gamzeyên li hinarikên min pir H xweşa wî çfine. (Xwedê dizane bê hîn çi gotinên xerUî bi lêv kir!) Dfire pîrbfiyîna xwe kir sedem fi xwest min maç bike. (Xerifiyekî wusa kambax bii ku!) A di wê gavê de Fedora kete hundur. MêrUc hinekî tengijî, lê dûre dîsa vcgeriya ser mijarê, pesnê giranî fi şermokiya min da, giramgîriya xwe ya ji ber vê cira min bi lêv kir û ji min tika kir ku ez bi çavekî biyanî U wa mêze nekim. Diire banî Fedorayê kir, vekişand hêlekê û bi sedemeke seyr xwest hinek peran bide wê. Lê Fedorayê ne girt. Di çûjana xwe de ew hemû sozên ku dabii, dubare kn, dfire U van gotinên xwe zêde kir îî da zanîn ku ew ê careke din jî were û wê çaxê ew ê ji min re cotek guhar jî bîne. (Pir tengijî dbcuya.) Pêşniyara guherandina xanî ji min re kir ku ew xaniyekî pir xweşik nas dike û ez jî mala xwe koçî wir bikim fi tew pêwîst nake ez peran jî bidim. Dîsa ducar kir ku ji ber namfiskarî fi

baqiliya min, wî pir ji min hez kiriye, fi şîret U min kir ku ez xwe ji xortên bêcir diirxînim. Di dawiya dawon de jî kat kir ku ew Anna Fedorovnayê nas dike û ew ê jî di nêzîk de were scrîêdana min, Anna Fedorovnayê ev vatiniya daye wa ku ji min re bibêje. A wê çaxê min hertişt fam kir. Rewşa ku ez ketimê, nikanim bi lêv bikim. Di jiyana xwe de ev cara pêşîn bfi ku ez diketim rewşeke weha. Ez gelekî hêrs bfi û çî hat ber devê min, min got. Fedorayê jî alîkariya min kir û me mêtuc qewutand der. Em gêhîştin wê bbyarê ku ev hemû tiştên ha, berhemên Anna Fedorovnayê ne. An ne, ma mêtuc ê çawa me nas bike?

Ez bêçare mam ku berê xwe bidime we, Makar Alekseyevîç, ez ji we daxwaza alîkariyê dikim. Ji bona Xwedê mm di 120

vê rewşê de nehêlin! Kêm jî be, ji deverina hinek pere deyn bikin. Êdî ne gengaz e ku em di vî xaniyê de bimînin, fi perê me yê barkirinê jî tune. Fedora jî wusa difikire. Bi kêmanî bîst fi pênc rûbU ji bo me divêt. Ez ê van perên we bi şûn de bidime we. Ez ê kar bikim ii bidim. Di van rojan de Fedora ê ji min re karên nû peyda bike. Ku faîzeke zêde ji we bixwazin, netirsîn, bibêjin erê fi H hev bUdn. Ez ê hemfiyê bicUm. Lê ji bona Xwedê min bê alîkarî nehêl! Ez bi xwe jî pê dêşim ku cU vê rewşa we ya xirab de ez we nerihet dikim, lê yekane hevviya min, hfin in. Di xweşiyê de bînin, Makar Alekseyevîç, min ji bîr nekin. Xwedê bi we re be!

V.D

4ê Havina Paşin

Kevoka min, Varvara Alekseyevna!

Ev hemû tiştên nepayî mala min jî xirab dike. Ev bfiyerên kambax ruhê min diguviştine û dêştine. Horiya min, daxwaza van pîremêrên xerifî, pîrejinên kurtolên ber deriyan fi cadfi-kar, ne tenê ew e ku min nexweş bixuiin, herweha cUxwazin min bavêjia ber lepên mirinê jî. Ez sond cUxwim ku ew ê bikin û bi ser jî bikevin. Lê mirin ji bo min çêtir e, ku ez nikani bim alîkariya we bikim. Ku ez nikani bim alîkariya we bUcim, ez ê rasterast bimirim, Varenka. Ji hêlekê ve jî cUfikirun ku ez alîkariya we bikim, hiin ê ji min dfirkevin. Weke çfikeke ku ji ber hêrişên kundên şevê, ji ber hêrişên teyrên çolê bihecire û ji hêlîna xwe bifire, hfin ê jî ji warê xwe dfirkevin. A tiştê ku ez pê xemgjn dikevim jî, ev e. Lê dUovaniya we jî timeye, Varenka! Ev çi karê we ye! Ji hêlekê ve xelk we dêştînin, we piçfik dbdnin û mîna ku ev têr nake, di ser de jî hfin racUbûi

121

çêlî nerihetiya min dikin ii hfin xwe di ber de nerihet dikin. Hûn sozê jî didme min ku hûn ê kar bikin fi deynê xwe bidm. Ji bo ku hfin deynê xwe di wextê de bidin, wusa xuyaye ku hûn ê saxiya xwe ya nîvçe jî bavêjin xeteriyê. Ma ev jî gotin m ku hiin dikin, Varenka! Hfin xwe bifikirm carekê! Ma pêwîst e ku hûn dirfinê bikin? Ma çi pêwîst e ku hûn serê xwe di ber hezar qehir fi qotikan de bêştînm, çavên xwe yên xweşik û saxiya xwe xerab bikin? Ax, Varenka, ax! Hfin dibînin ku ez bi kêrî-tiştêkî nayê, horiya min. Viya ez jî dizanim. Lê ez ê bikim ku bi kêrî tiştêkî bê. Ji bo ku ji heq hemfi dijiwariyan werime der, ji bilî karê xwe ez ê U derve jî lê bigerim. Ez ê bi-



çim ba niviskaran û ji wan daxwaza karê paknivisiya berhemên wan bikim. Lewra ez dizanim, dako, baş dizanim ku ew jî li nivismendên baş digerin. Lê ez li darê dunyayê nikanim destûrê bidim ku hûn biçin fi di ber qehir ii qotika xelkê de xwe bihelînin.

Dayika min, bawer bikin ku çî ji destê min were ez ê bikim. Bimirim jî ez ê ji derekê peyda bikim. Hûn dinivisînin ii didine zanîn ku ez ji faîza zêde netirsim. Ez natirsun, kevoka min. Tiştê ku min bitirsîne tune êdî. Min dU heye ku ez çel rûbilî deyn bikim, Varenka, ka hûn çî dibêjin? Ma hûn bawer dikin ku bi gotinekê re çel riibUî bi deyn bidine min? Bi gotineke din, aya baweriya wan ê bi min were ku ez ê bikani bim vî deynî bi şûn de bidim? Yekî ku cara pêşîn H rû fi rewşa mm binêre, gelo baweriya wî ê bi min bê? Ca hûn min bigirin ber çavên xwe fi li min binêrin, dako, ka aliyekî mm î ku ez pê baweriyekê bidime yekî hemberî xwe, heye? Ka di vî warî de hiin çî difikirin? Bawer bikin, tirseke mezm U mm rabfiye. Tirsekc wcke nexweşiyê ye!

Ji vî çel rfibiU ez ê bîst ii pêncan ji we re veqetînim, Varenka, ez ê duduyan bidime xwediya xaniyê xwe, perên mayî jî ez ê pê debara xwe bUcim. Ya rastî, diviya bfi mm zêdetir bida

122

xwediya xaniyê xwe, lê ku hûn bi kêmaniyên min bizani bin, hiin ê têbigêhîjin ku zêdetir jî ji destê min nayê. Herweha ne pêwîst e ku meriv U ser vê yekê zêde jî bipeyive. Ez ê bi rûbU-ekî zîvîn ji xwe re cotek potîn bikirim. Nizanim bi ev yên xwe yên kevn ve ez ê xwe bigêhînim buroyê, an ne. Divê ez ji xwe

re hustumalekê jî bikirim, ev biin çend salên min ii ev ya kevn, riziyaye êdî. Lê ji ber ku we soz dabû min ku we ê ji kefiya xwe ya kevn, ji min re hustumal û sermUekê çêbikin, wê çaxê jî pêwîst nake ku ez hustumalekê bUcu-ûn. Herweha pirs-girêka mm ya potîn fi hustumalê çareser bfiye. Em werin ser bişkovan, berxika min. Hûn jî dizanin ku meriv bê bişkov nikanin bigerm. Bişkovên çakêtê min nîvê wan ketme! Dema ez difikirmi ku ekselans ê vê belengaziya rewşa min bibîne fi tiştêkî bibêje, zirav U min diqete. Lê xem nake, ji xwe ew çi bibêje jî

ez

ê

nebihîsim.

Lewra

wê

çaxê

ez

ê

tavilê ji

şermesariyê bunirim. Ax, dako! Piştî kirîna van hemû tiştên pêwîst, bi tevayî sê riibil ê bimînin ku ew jî ji bo debar ii knîna nîv libre(\*) titfina min e. Lewra bê titûn ez nikanim bijîm, horiya min. Lê ev neh rojên min e ku lêvên min bi qelûnê ne bûne. Ya rastî bêyî ku ji we re bibêjim jî min ê titfin bigirta, lê dUê mia ev tiştta ne hewand. Ma hfin U wor di tunebfin fi xizaniyê de bijm fi ez jî li vir li kêfa xwe binêrim! Loma ez jî van hemfi tiştên ha ji we re dinivîsînim ku dfire hfin ji xwe neyêşin. Ez rasterast ji we re bibêjim, Varenka. Di van rojan de

destê mm pir fi pn teng e, di jiyana min de ev cara pêşîn e ku ez dikevim rewşeke weha, Varenka. Ne xwediya xaniyê mm û ne jî yekî din, kesek rûmetê nade min. Ji her pêwîstiyê bêpar ii heta qirUcê deyndar im. Li ciyê kar, hevalan berê jî riimeta min nizanî bûn, lê anuha tew min nakin dewsa merivan. Edî heta ku ji min tê, ez xwe jî fi rewşa xwe jî ji hawordora xwe ve- (\*) Lîbre: Pîvaneke kevn e û bi qasî 425 gramên îroyîn e. WW 123

dişêrim. Dema ez diçime kar, ji bo ku haya kesekî jê nebe, ez li ser kêlekê dikevim hundur û hêdîka vedikişim quncikê xwe. Ruhê min, tenê ji we re diwêre ku ez van hemfi tiştan kat dikim. Lê ku xelk deyn nedin?... Lê ya baştirîn ew e ku meriv ji nuha de tiştên wcha neyine bîra xwe ii dest H xwe sar neke, Varenka. Ez viya dinivisînim ku hûn jî nekevin serêşa ramanên weha îî hêviya xwe neşikînin. Xwedêyo, lê ku tirsê me were serê me, hiin ê çî bikin? Ku hiin ji \dr bar nekin, em ê U dîwaserê hev bibine cîran. Na, na! Ez bê pere venagerim, mabdrab dibim ii dimirim!

Min dîsa dirêj kir fi kir. Qaşo min ê hîn ruyê xwe jî kur bikira. Riyê kurkirî, merivan maqfiUu- fi xweşUctu- dide xuyakirin. Bi ya Xwedê! Ez ê banî Xwedê bUdm fi têkevim rê!

Makar Devûşkîn

5ê Havina Paşin

Makar Alekseyevîçê xoşewdst!

Bi kêmanî bila dest li we sar nebe! Ji xwe xem ii nerihetiya me hertim heye. Ez ji we re sî kopêkên zîvîn dişînim, zêdetir jî ji destê min nayê ku ez peyda bikim. Çî tiştê ku ji bo we bê-

tir pêwîst e, ji xwe re bikirin ii bi kêmanî sibehê H xwe bînin. Di destê me de jî tiştê ne maye. Ez jî nizanim ka em ê sibê çî bikin. Rewşeke xemgîn e, Makar Alekseyevaç! Lê dîsa jî li ber nekevin! Ku em bi ser nekevin jî, xem nake! Fedora dibêje; ew ewqas ne girîng e, heta demekê jî em dUcanm di vn de bimînin. Lewra ku em bar jî bUdn, ew ê li pey me bigerin fi U kuderê be jî ew ê me bibînin. Ku hertişt ne wusa bêhtengjn bfiya! Ku ne wusa bûya, min ê ji we re nameyek xweşUctir binivisîya.

124

Çi xwiyekî we î seyr heye, Makar Alekseyevîç! Ku hûn wusa hertiştî U dilê xwe bigirin, ruyê we ê jî tu carî nekene. Ez hemû nameyên we jî bi baldarî dbcwînim Û dibînim ku ji xwe bêtir hûn li ser min nerihet m û ji bo min xemgîn in. Herkes ê çêU dilpakiya we bike, min şik ji viya tune, lê ez ê jî bibêjim ku dilpakiya we ji we zêdetir e. Ez şîreteke hevalane li we bikUn, Makar Alekseyevîç: Ji ber hemû çêyiyên we, ez gelek sipasdarê we me û mala we ava! Lê piştî ewqas xemgînî Û nerihetiyên we yên ku ez bêyî daxwaza xwe bûm sedem, dibînim ku hûn hîn jî serê xwe di ber kêfxweşî, xemgînî û pêjnên min de dêşînin û bi wan dijîn. Ku meriv ewqasî serê xwe di ber xelkê de bêşîne û dUê xwe pê bişewutîne, tê wê manê ku meriv bi destê xwe bextrcşiyê li xwe peyda dike. îro dema ku hûn ji buroyê hatin mala me û min çav li we xist, ez gelekî tirsiam. Hûn ewqas gwînvemirî, ewqas bêhêvî û tevlihev bûn ku!... Ez tavilê têngêhîştim ku karê we li hev ne hatiye, hûn jî naxwazin ji min re bibêjin ku pê ez xemgîn nebim. Lê dema

ku we rûkenî U ruyê min dît, dilê we jî pe re xweş bû. Xeman nexwin û bêhêvî nebin, Makar Alekseyevîç, hişê xwe bidin serê xwe. Ez H ber we digermi û viya ji we lava dikim! Hûn ê bi-bînin ku hertişt ê ber bi başiyê biçê û bi başiyê biqede. Ku hûn wusa hertim kul û kovanên xelkê ji xwe re bikin xem, jiy-an ê ji we re bibe barekî giran. Bi xatirê we, xoşewîstê min! Ji we lava dikim ku hûn di ser min de hustuxwar nebin.

V.D

5ê Havîna Paşîn

Varenka min!

Baş e, horiya min, bUa wusa be! Hûn dibêjin, ne xemeke

125

ewqas mezin e ku min pere peyda ne kirine. Bi kêmanî ji hêla we de bêhn hat ber min ii ez kêfxweş biim. Tew ez xwe bex-tiyar jî dibînim. Lewra we pîremêrekî wekî min reben di cî de ne hişt ii hfin ne çfin. Ya rastî, dema min di nama we dît ku we U ser min tiştên xweşik nivisandiye fi pêjnên min bi lêv ki-riye, ez gelekî pê dilşa bfim. Viya, ez ji serbiUndiya xwe na-bêjim. Lê cz tégêhîştim ku hûn ji min hez dikin. (Ma ne wusa be, hiin ê çima ewqas li ser pêjnên min bisekinin?) Loma ez jî ji kêfxweşiya xwe dinivisînim. Lê anuha ne wexta mijara dU ii pêjnên min e, em dev jê berdin, bila dUê min U ciyê xwe bimî-ne.

Hiin rê didine ber min fi dibêjin ewqas kezebşewutî nebin.

Belê, hiin rast dibêjin, horiya min, ez jî naxwazim diltenik

bim. De ka hiin bibêjin, dayika min, ez ê sibê çawa bi van po-tînan ve biçime buroyê? Pirsgirêk jî ev e. Ev ramana tenê têra

mabcirabiya meriv dike. Lê ez viya jî bibêjim, dako, ji bo şêri-  
niya nefsa giyanê xwe, ez xemgîn ii hustuxwar nabim. Ez xwe  
didim ber hertiştî. Di şilî û şepeliya herî dijwar de jî, ez dUca-  
rim bê palto ii bê potîn derkevim der. Ji bo min qet xem na-  
ke. Ma ez çi me? Lê ku neyar ii xêrnexwaz di kuçê de min  
pêxwas bibînin, ma ew ê li pey min çi zimandirêjiya nekin ku!  
Ji xwe meriv palto jî ii potînan jî, ji xwe bêtir ji bo xelkê U xwe  
dike, dayika min. An jî ji bo parastina navfidengê xwe pêwas-  
tiya min ji cotek potîn heye, dako. Ku potînên meriv qul be,  
nav fi şerefa meriv dikeve binê lingan!... Ji min bawer bUdn,  
dako. Ez merivekî pîr im, jiyame, ez dunyayê ii merivan nas  
dikim. Dev ji van niviskarên qeşmer fi zimandirêj berdin, hûn  
guhdariya min bikin.

Lê min hîn jî ji we re ji serfiber ve hemfi tişt kat ne kiriye  
bê îro li vir çi qewumî. Nerihetiyên ku tenê vê sibê bi min gir-  
tin, di hundurê salekê de ewqas nerihetî di serê kesekî cUn de  
ne hatine. Bênerin bê çawa bû.

126

Ji bo ku mêrik bibînim û dûre jî di wextê de bigêhîjim ser  
karê xwe, ez sibê zû rabûm û ketim rê. Baraneke xurt dibarî û  
her dever celbox bû. Min paltoyê xwe U xwe pêça û ez meşiy-  
am. Di rê de jî, min her banî Xwedê dikir û di dUê xwe de di-  
got:

«Xwedê,

tu guneh û gunehkariya min bibexşîne û

daxwaza min bi cî bîne!» Dema ku ez di ber dêrê re derbas

bûm, bi gunehweşînî min tobe û îstbrfar kir. Dûre jî fikirîm ku

cz bi vî awayî bi Xwedê re têkevime bazariyê, tevgereke na-xoş e. Di van ramanên xwe de çû bûm xwarê, bêyî ku li tiştêkî binêrim û rêya pêş xwe bibînim, ez dimeşiyam. Kuçe vala dbcuyan. Ew kesên ku carina ez lê rast jî dihatim, diyar bû hemû jî bi ramanên serê xwe daketi bûn. Ê bi lez li pey karekî xwe dibezyan. Ev tiştêkî normal e. An ne, ma kî wusa zû, di şîU û şepeliyeke weha de derdikeve seyrangerê? Refekî karkirên bi kincên qirêj pêrgî min hatbi, mêrikan bi zanatîxwe U min qelibandin û di ber min re dcrbas bûn. Xofek kete dilê min û ez tirsiyam. Ya rastî, min tew ne dbcwest ez çîroka peran jî bînim bîra xwe. Wexta min xwe gihand ser pira Voskresenskayê, bêyî ku bizani bim tew çawa bû, paniya potîneke min jê ket. Ê di wê gavê de ez û nivismendê me î Yermolayev rastî hev hatin. Xwe hinekî da alî, di rewşa giramgiriye de sekinî û mîna ku daxwaza perê qulteke vodka li min bike, her li pey min nêhirî. Ez xwe bi xwe fikirîm û min di dilê xwe de got: «Of, dostê min, ma anuha wexta vodkayê ye!» Ez gelekî westiyayî bûm. Ez sekinîm, min hinekî bêhna xwe girt û min dîsa riya xwe domand. Ji bo ku ez ramanên xwe bi tiştêkî din ve mijûl bikim û bi vî awayî pêlên wêrekiyê U xwe berhev bikim, min li hawirdora xwe dinêrî. Min dbcwest ku ez xemgîniyê li xwe belav bikim. Lê ne dibû, tiştêkî din bala ramanên min ne dikişand. Ê di ser de jî ez di çilk û çamûrê de lewutî bûm û min ji xwe şerm dikir. Di dawiya dawîn de ji dûr ve çavên min bi textexaniyekî zer ket. Banê wê bi tara-

127

çayê(\*) bii. Min di dUê xwe de: «Ev e.» got. «Ew xaniyê ku

Emelyan Ivanoviç digot, "Mala Markov" divê ev xaniya be. (Ew merivê ku bi faîzê peran dide, navê wî Markov e, dako.) Ji dilpckiyê dest û lingên min li hev geriya bfin. Li gel ku min dizanî bii ew mala, mala Markov e jî, pasebanê ku di wir re derbas dibfi, min rabû jê pirsî ii gotê:

«- Ev mala, mala kê ye, dosto?»

Paseban jî merivekî cirnexweş bii. Mîna ku ji yekî hêrs bfi be, bi mirfizekî tirşfital ii bi dijwarî kire zirtîn fi got:

«- Mala Markov e!...»

Ji xwe tevayiyê van hemii pasebanan wusa bêcb- in. Gerçî min çî ji paseban e, lê dîsa jî ev tevgera wa ya naxoş bandore-ke xirab li min kir. Naxoşiyên ku meriv jê ditirse ku ew ê bi serê meriv de were, tên jî. Ev hertim wusa ye...

Li pêş malê ez sê caran çiiim fi hatim. Her ku ez diçfim fi dihatim, tirs li min zêdetir dibfi, xwe bi xwe difUdrîm fi min digot: «Na, ev meriva quruşekî jî bi deyn nade mm. Ez ne nasekî wî me, rewşa min jî ne rewşeke maqfil e, ev daxwaza min li ser tayekî deziyê xav maye...» Dfire min di dUê xwe de got: «Ca ez biceribînim, ku Xwedê U hev hanî be, ew ê bibe. Bi kêmanî ez ê dfirc poşman nebim ku min jê ne xwest. Ma ew ê min bbcwe!» Bi vê yekê re min hêdîka deriyê hewşê vekir. Lê vê carê jî xezebeke din derket pêşiya min. Kiiçikekî ehmeq fi mendebfir da dfi min û heta ku jê dihat H pey mm cUkire ew- tîn. Tiştên weha hûr fi piçfik hertim serê merivan tevUhev di- kin, dako. Ew hemû biryarên ku min berê di serê xwe de civandi bfin, di wê gavê de wenda biin. Bi rewşeke nîvmirî ez ketim hundur. Di tariyê de min pêşiya xwe ne cUt û di devê derî de ez li jinekê qeUbîm. Jinika ku şîr ji satUê valajî dîzUcê



(\*) Taraça: // îtalî tê. Li ser banê xaniyan ciyên servekirî. Teras. WW

128

dikb, hemfi şîrê xwe rijîya. Heta ku jê hat, vê jinika ehmeq kire qîreqîr ii got: «Tu H vir çi digerî? Ma tu pêşîya xwe nabînî?» Ez van tiştan dinivîsînim û dbcwazim pê bi we bidime zanîn ku hertim di rewşên weha de xezebên wusa têne serê min,

dayika min. Bêyî ku tişteki min û van naxoşîyan U ber hev hebe, dibînim ku hertim li ber Ungên min radibin. Ez bawer im ji bextreşîya min e.

Bi bu-ebba vî dengî re pîrejineke fînî derket. Xwediya xênî bfi. Ez rasterast çûm ber wê fi min pirsî:

«- Markov li mal e?»

«- Na.» Got fi dfire hinekî rawestiya. Piştî ku baş U min nêhirî, li min vegerand ii got:

«- Hûn çi ji wa dbcwazin?»

Min jê re kat kir. Min çêU Emelyan îvanovîç kir fi pê da zanîn ku min ji bo karekî girîng ew nerihet kiriye. Pîrejîne bannî keça xwe kn. Keçeke salbuhurî ii pêxwas derket der. Pîrejînejêre:

«- Biçe banî bavê xwe bike, U jorê U ba kirêdaran e...» got fi dfire veşîya ser min:

«- Hiin keremî hundur bikin.»

Ez derbasî hundurê odeyekê bûm. Gelek tablo û portreyên generalan bi dîwaran ve hati bfin dardekirin. Sedirek, maseyek gulover fi di guldankên xwe de kulîlkên balsamîne fi

resedayê bi ber çavên min ketin. Di wê gavê de ez ramiyam ku rabim fi biçim. Bawer bikin, dako, pLr ne ma bfi ku ez ji wir bireviyama! Xwe bi xwe min di dilê xwe de got: «Çêtir e ku ez sibe werim. Dibe ku dunya jî xweştir be ii bi kêmanî he- ta wê çaxê ez ê xwe hinekî serast jî bikim. Ji xwe min îro şîr rijand fi va ye general jî bi hêrs û awurtûjî U min dinêrin...» Min kir ku ez ber bi derî biçim fi di wê gavê de Markov kete hundur. Merivekî gelêrî, porsipî û bi çavên zexel bfi. Şevkira- sekî gemarî U xwe pêça bfi fi wek pişt jî benek U ser şidandi 129

bfi. Ji min pirsî ka ez çi cUvêm. Min navê Emelyan îvano\aç da û jê re got, çîrok weha fi weha ye, min pê da zanîn ku pê- wîstiya min bi çel rfiUî heye û...

Min gotinên xwe ne qedand. Ez ji çavên wd têngêhîştim ku ev karê min nabe fi min wenda kir. Lewra wî peyva min birî fi got:

«- Na, perê min tune. Ka tiştêkî we î ku hfin bi gnûganî daynin, heye?»

Min kir ku ez jê re kat bikim û min gotê:

«- Na, tiştêkî min î ku ez bi girfiganî bidim, tune. Lê destê min pir teng e... Emelyan Ivanovdç ji min re...

«- Min çi ji Emelyan îvanovîç e! Perê min tune.»

Ji xwe min dizanî bû ew ê wusa bibe. Tiştê ku ez difikirîm, hate serê min. Xwezika di wê gavê de erd biqeUşiya fi ez tê- ketamayê, Varenka! Ez cU ciyê xwe de sipfisar bfim, çog U min sist bûn fi tevziyên sar girte ser pišta min. Min U ruyê wî nêhirî, wî jî awurên xwe bi min de kir, mîna ku bibêje: «De

bide ser riya xwe û biçe, heval! Tu hîn çi sekimye?» U min dinêrî. Ez bawer im ku ev yeka di re\^ke din de bibfiya, ez ê ji şermê têketama erdê.

Ji min pirsî fi got:

«- Pêwîstiya we û peran çi ye?»

Ca lê binêrin bê çi pirsê ji min cUke, dako! Min devê xwe vekir ku tişteki bibêjim û bi kêmanî pê xwe biparêzim. Lê Markov peyva min birî û yekser got:

«- Na, perê min tune, ku hebûya min ê ji cUlûcan bida.»

Min gelekî xwe havêtê fi c:ar bi car jê re got ku:

«- Ez perekî ewqas zêde naxwazim, ez ê di wextê de deynê xwe bidim û dibe ku tew ez beriya wexta xwe jî bidim.»

Min pê da zanîn ku ew çiqasî faîzê bixwaze, ez ê bidimê.

Min jê re sond jî xwar ku ez ê \d deynê xwe bi rêkûpêkî bicUm.

Di wê gavê de min hîin hanîn ber çavên xwe, dako. Min de-  
130

stengiya we, pêwîstiyên we û min ev nîv rûbilê we yê dawdn hanî bîra xwe.

Markov ji nfi ve bersiv da û got:

«- Pirsgirêk ne faîz e, lê ku tişteki girfiganiyê hebîiya... Ya rastî perê min tuneye, bi navê Xwedê tuneye. Ku hebûya min ê bi kêfxweşî bida.»

Bê şerm û bê fedî sond jî xwar, çapûlgerê nerind! Nuha nayê bîra min bê ez çawa ji wir derketim, çawa (U Vîborskayê re min xwe gjhand pira Voskresenskayê, dako. Ez gelekî westiya biim fi ji sermayê cUricifîm. Dema ku min xwe g^and buroya ciyê kar, saet deh bfi. Min kir ku ez çilk û çamûra ser

xwe baqij bikim, lê dergevanê buroya me Snegjrev îcaze ne da ii got:

«- Nabe, ezbenî, hûn ê firçê ji hev binJoin, ev malê dewletê ye.»

Ca lê binêrin bê hinek meriv çiqas zfi têne guhertin, dako! Bi qasî wî paçî jî riimeta min li ba wan ne maye. Ew paçê ku pê şekalên xwe paqij cUkin! Ma hûn dizanin bê tiştê ku min bêtir tetirxanî cUke, çi ye, Varenka? Ne pere ne. Hemfi ev pistepistên bi dizî, pêhenek û tinazên jiyana rojane ne... Lê meriv nizane, te hew dît ku ekselans rojekê dîsa banî min kir. Na, dako, na, ew rojên xweş buhurîn êdî. îro, min hemû nameyên we ji nfi ve xwend. Xemgjnyekê girte ser min! Bi xatirê we, dayika min! Sitara Xwedê U ser we be!

M. Devûşkîn

NOT: Min xwest ku ez vê xemgjjaiya xwe ji we re bi nîvrast û nîvhenekî binîgarînim. Lê wusa xuyaye ez heq ji henekan jî nayê der. Min dU hebfi ku ez we hinekî kêfxweş bikim. Ez ê sibê werim mala we, dako, ji sedî sed ez ê werim.

131

Ilê Havina Paşin

Varvara Alekseyevna, kevoka min, dayika min!

Mala min xirab bfi, ji binî ve malik H me herduyan jî xirab bû. Navfideng fi şerefa min kete binê lingan. Min maUk li xwe şewutand fi hiin jî pê re av fi av çfin... Ez bi xwe bfirm sedemê vê yekê. Çavsoriyê li min dikin, dako, min piçûk dbdnin ii bi min dikenin. Xwediya xaniyê me her cU ser min de dike birebir, peyvan H ruyê min dixê. îro jî di ser min de kire qêrîn fi

ez kirim mîna paçekî bêrûmet. Ê êvarê jî ji civata mala Ratazyayev,  
yekî rabfi bi dengekî bUind  
pêşnfima nameyekê  
xwend, nameya ku min ji we re nivisî bfi û ji bêrîka min de keti bii. We bidîta bê çî tinaz bi me dikirin, dako! Ma çî ne digotin ku! Biqîna wan bû dikenyan!... RczUên bêbext!... Ez çfim ba wan, min duriitî û bêbextiya Ratazyayev H ruyê wî xist. Lê Ratazyayev li min vegerand ku: ez bi xwe fêlbazekî durû me û li pey xapandina jinan digirim; fi got:  
«- Van tiştên ha, hûn bi dizî dikin. Hfin Lovelacekî(\*) rastîn in.»

Herweha navê min bii Lovelace fi êdî herkes bi vî navî banî min dikin. Binêrin, horiya min! Edî wan hertişt bihîstine fi bi hertiştî dizanin. Bi we jî dizanin, tiştê ku U ser nizani bin, ne maye. Mabdrabî ye! Faldonî jî nola wan e, ew jî weke wan difikire. Ji bo kirîna roviyên heşandî îro min kir ku ez wd bişînim dikana goşt, lê wî ne xwest biçe fi got:

«- Karê min heye, ez nikanim.»

Min pê da zanîn fi gotê:

«- Tu mecbûrê vî karî ye.»

Wî H min vegerand û got:

(\*) Lovelace: Di sedsala 18. de, di edebiyata fransî de hesaşekî lehengê romaneke bi navûdeng e. WW

132

«- Ez tew jî ne mecbfir im. Heta ku hfin deynê xatfina min nedinê, ez jî ne mecbûrê destirmaniya we me.»

Li hemberî neheqiya vî gundiye naşî, min xwe ne girt fi gotê:

«- Serhişk!»

Lê wî dîsa li min vegerand ii got:

«- Dengê serhişkekî tê min!»

Baweriyeke wusa li min çêbii ku wî vexwariye fi loma wî hay jê nîne bê ew çî dibêje. Ez lê hêrs biim fi min gotê:

«- Ez bawer im tu serxweş î, gundî!»

Lê wd li min vegerand fi got:

«- We çî jê ye? Na xwe perê vexwarina min jî we daye?

Hfin bi xwe ketine dfi perê vexwarinê. Hûn diçin devê xwe li ber jinekê xwar dikin fi pênc kopêkan jê dixwazin. U qaşo hfin merivekîji malmezinan in!»

A hûn bi xwe jî dibînin bê rewş hatiye kuderê, dayika min!

Rasterast ez şerm dikim ku bijîm, Varenka! Ez ji dînekî, ji serseriyekî bê cî fi war xirabtir bfime. Ev çî malkambaxî ye!

Malik U min şewutî, pişt li min şikiya îê êdî pişt min ê tu carî rast nebe!

M.D

13ê Havina Paşin

Makar Alekseyevîçê xoşewîst!

Xezeb li ser xezebê li me dibare îê ez bi xwe jî nizanim bê meriv çawa bike. Lê tew hiin, hfin ê çî bikin? Hêvî ji min tune. Lewra min îro utî di ser destê xwe î çepê de xist û xwe şewutand. Anuha jî ez nikanim kar bUcim. Ê ev roja sisiyan e ku Fedora nexweşa nav nivînan e. Ez gelekî xemgîn im. Ez ê

133

ji we re sî kopêkan bişînim. Ji xwe tevayiyê perên ku cU destê me de heye jî, ewqas in. Di vê rewîşa we ya cUjwar de, Xwedê dizane bê min çiqasî dixwest ez alîkariya we bikim! Ez ewqas xemgîn im ku hindik maye bir fi berdun girî. Di xweşiyê de bi-mînin, dostê min! Ku hûn îro bihatana serlêdana me, dUê min ê hinekî pê xweş bibfiya.

V.D

14ê Havina Paşin

Makar Alekseyevîç!

Ma we hay ji xwe heye bê hûn çî dikin? Ma hfin ji Xwedê jî natirsin? Hiin ê min dîn bikin. Ma hfin şerm nakin? Hûn malikê li xwe dişewutînin, parîkî şerefa xwe bifikirin. Hfin merivekî namiiskar fi malmezinekî şerefmend in. Wexta ku herkes bi van kirinên we bihese, hfin ê çî bUdn? Wê çaxê divê hûn ji şermesariyê bimirin. Ma hfin ji porê xwe î sipî jî şerm nakin? Bi kêmanî ji Xwedê bitirsin! Fedora dibêje ku ew ê êdî alîkariya we neke fi ez ê jî êdî peran neşînim. Ka hfin dizanin bê we ez kirime çî rewşê, Makar Alekseyevîç! Ji we wetrê Hv fi tcvgerên we yên naxoş dilê min nayêşîne? Hfin hîn jî bawer nakin bê ji ruyê we de ez çî dikişînim! Ez newêrim ji devê derî derkevim derve. Herkes H min dinêrin fi bi tUiyan rayê hev didin. Tiştên nemayê li ser min dibêjin. Dibêjm, bi serxweşekî rc li ba dikeve. Bihîstina vê yekê ewqas min dêşîne ku!... Dema dikevin piyê we ii we tînin malê, hemfi kirêdar bi dUverşîn li we dinêrin fi di nav xwe de dibêjin: «Dîsa wd karmencU tînin malê!» Ez nikanim bi lêv bikim ku (U ber we de ez çiqasî şerm dikim. Sond dbcwim ku ez ê ji vir bar bikim. Ez ê biçim destirmaniyê bikim, kincên xeUcê bişom, lê êdî di vî xaniyd de

namînim. Min nivisancU bfi fi ji we lava kiri bfi ku hûn werin, lê hfin ne hatin. Diyar e riimeta hêsn fi daxwazên min H ba we tune, Makar Alekseyevîç. Û ka we pere ji kuderê peyda kirin? Ji bona Xwedê hay ji xwe hebin! Hiin rasterast bi daxwaz ii zanatî xirabiyê H xwe dikin. Ma şerm fi fedî jî bi we re tune? Do xwecUya xênî derî H we venekiriye fi hûn jî heta sibê U ber devê deriyê eywanê razane. Ez pê cUzanim. Dema ku min ev yeka bihîst, ew tenê Xwedê dizane bê ez çiqasî xemgîn ketim! Rabin fi werin mala me. Em ê wexta xwe xweş derbas bikin. Em ê bi hev re bixwînin fi bîranînên kevn nfi bikin. Fedora ê jî çêlî serlêdanên xwe yên pîrozwer, serlêdanên manastiran(\*) bike. Ji bona Xwedê, dostê min, ji bo min xwe neşewutînin fi min jî U ber nehelînin! Tenê ji bo we dijîm û ji bo xatirê we ez li vir dimînim. Ez pê dizanim bê re^^ we çiqas xirab e. Lê dîsa jî U hemberî dijwariyên dunyayê hay ji xwe hebin û wek merivekî şerefmend bimînin. Ji bîr nekin ku xizanî ne tiştêkî şerm e. Ma çi pêwdst e ku hfin ewqas hêviya xwe dişikînin? Ew ê derbas be. Bi ya Xwedê hertişt ê serast bibe, bêhna xwe hinekî fere bikin. Ez ji we re bîst kopêkan dişikînim. Ji xwe re titiînê an jî dUê we çi xwest, bikin. Lê ji bo Xwedê van peran ji bo tiştên xirab bi kar neynin! Divê hfin ji sedî sed werin serlêdana me. Weke berê xwe nedin hev fi şerm nekin. Şerm pêjneke bêmane ye. Ku hfin piçekî jî poşman bibin, ev têr dUce. Hêviya xwe ji Xwedê nebirin! Ew hertiştî baştir (Uke fi cUde ser riya rast.

V.D



(\*) Manastir: Jiyewnanîtê. Xewlexanên oldarên xiristiyanan e.

WW

135

19ê Havina Paşin

Dayika min, Varvara Alekseyevna!

Ez gelekî şerm dikim, ruhuka min, gelekî. Lê (Usa jî ez (U tevgerên xwe de xirabiyeke wusa mezin nabînim. Ma çî mabdrabî ye ku min xwestiye ez hinekî kêfxweş bibim? Lewra di demên weha de ez tew U ser binê potînan xwe nafikirim fi tiştên weha ji bo min bêmane dibin. Binê potînan ez her wekî binê potînan, tiştêkî bêrûmet û qirêj cûbînim. Potînan jî tiştêkî bêmane ye! Feylesofên yewnanî hertim pêxwas geriyane. Em çima serê xwe ewqas di ber vî tiştê bêrfimet de dêşînin? Herweha çima meriv rabin min piçfîk bibînin û min bêşînin? Ax, dako, we çî tiştên tal ji min re nivisandine! Ji wê Fedorayê re jî bibêjin ku ew jineke bêyom, zimandirêj, tîztîzok ii gelekî ehmeq e!

Em werin ser mijara porê min î sipî, U vir jî hûn çewt difikirin, rindika min. Bi qasî ku hfin dizanin, ez ne pîr im. Emelîyan silavan li we dike. Hûn dinivîsînin ku hfin xemgîn ketine ii hfin girîyane. Lê ez jî bi we didime zanîn ku ez jî xemgîn ketim û ez jî girîyam. Bi daxwaza saxî fi bextiyariya we, ez nama xwe diqedînim. Ku hiin pirsiyariya min bikin, ez baş im fi rihetîya min jî li cî ye.

Dostê we

Makar Devûşkîn

21ê Havîna Paşin

Hevala min ya giranbuha, Varvara Alekseyevna!  
Ez dizanim ku ez U hemberî we neheq im. Hfin çi cUbêjin  
bibêjin, lê zanîn fi têngêh^tina viya bi kêrî tiştêkî nayê, dako.  
136

Beriya ku ez bikim jî min dizanî bfi ev neheqî ye, min bi zanatî kir û ez ketim vê rewşê. Lê tiştê ku bû, çû êdî! Ne ez merivekî xirab û ne jî ez yekî dilkevir im. Ji bo ku meriv wî dilê we bişikîne ii perçe bike, ne kêr fi ne zêde; divê meriv wek pilingekî devbbcwdn be. Lê dUê min bi xwe dUekî berxan e fi wek ku hûn jî dizanin, devbbcwînî ji min gelekî dfir e. Horiya min, herweha bi qasî min, dU î ramanên min jî di tevgerên min de bêguneh in. Ê loma ez nizanim bê ev gunehkarî jî çawa û ji kuderê hatiye. Tiştêkî dfirî aqUan e, dako!  
We ji min re sî kopêkên zîvîn şandiye û dfire jî bîst. Dema ku ez çav li van perê we sêwiya Xwedê dixim, kezeba min cUperite. We destê xwe şewutandiyê ii cU nêzîk de hûn ê ji birçîna bimirin, lê hiîn hîn jî dinivisînin fi dibêjin, ji xwe re titiînê bikin. Ez çi merivekî dUkevir bûme! Ma min ê wek çapfilgerêkî bê şerm û bê dUovanî, keçek weke we sêwî jî bişêlanda!  
A dema ku ez viya têngêhîştim, wêr H min wenda bfi, dako. Ango di destpêkê de min hîs kir ku ez bi kêrî tiştêkî nayêm fi tew bi qasî perçê binê potîna xwe jî nabim. Dûre ez ramiyam ku ji vir fi weha nabe ku ez êdî bi çavê merivekî H xwe binêrim. Loma di dawîya dawîn de min têderxist ku ez serseriyekî jêrpaye û aferîdekî bêrûmet im. Dema ku meriv xawên û giramiyê li hemberî xwe wenda bike fi baweriya xwe bi xwe neyîne, a wê çaxê tê wê manê ku meriv hertiştê xwe wenda ki-

riye. Û di rewşeke weha de êdî mabdrabî digire ser meriv. Di vê yekê de tu gunehkariya min tune, sernivisa min wusa hatiye nivisîn. Ez derketim derve ku hêwa li serçavê min bikeve û hinekî werime ser xwe. A wê çaxê her ku çû xirabtir bû. Derve bêhtengîn bfi, hêwa sar fi baran dibarî. Di ser de jî rastî ez Emelyan hatim... Mêrikê reben hertiştê xwe bi girûganî daniye, Varenka min, tew tiştê xwe ne hiştiye. Gava ku ez lê rast hatim, ji du rojan fi vir de devê xwe bi tiştê ne kiri bû. Tew cU wê gavê de dbcwest tiştê xwe î cUn jî bi gnfiganî

137

dayne ku meriv bimire jî vê yekê nake. A wusa, Varenka, ji daxwaza xwe bêtir ji bo daxwaza dUê wî, min bi ya Emelyan kir. A gunehkariya min jî bi vî awayî bfi, dayUca min! Dûre em herdu jî wusa girîyan ku! Me hûn bi bîr hanîn. Emelyan merivekî pir baş ii dUtenik e. Ez jî wusa dUtenik im, dayika min, û ji xwe ji ber vê yekê ye ku ev tiştên ha têne serê min. Ez dizanim bê ez çiqasî deyndarê we me, horiya min! Piştî hevnasiya me, min xwe baştir nas kir fi ji we hez kir. Beriya hevnasiya me, ez bi tikfitena serê xwe bfi, mîna ku ez U vê dunyayê ne dijiyam û her di xew de bûm.

Ev xêrnexwazên hevalên li dora min, di serçavên min de jî li kêmasiyan digeriyan û wan ez piçfik didîtim. U herweha min jî ji xwe şerm kir. Wan bi min dan zanîn ku ez ehmeq im, wê çaxê min bi xwe jî bawer kir ku ez ehmeq im. Bi hatina we re jiyana min ya tarî rohnî bii, dil fi ruhê min geş bû, bêhn li min fere bii fi tégêhîştim ku ez ji xelkê ne kêmtir im. Ku ez ne yekî maqîil, kubar fi xwedîgotin bim jî, ez merivek im; bi dil ii

ramanên xwe ve merivek im. Lê anuha dema ez tîgêh<sup>^</sup>tim ku êdî sernivisa min dev ji min bernade, giraniya xwe daye ser min û min dipelbdne, min jî rûmet ne da xwe, giranî fi hêza berxwedana xwe wenda kir. Ji ber ku anuha hûn bi hertiştî dizanin, loma ez jî bi hêsirên çavên xwe ji we lava dikim ku hfin careke din U vê mijarê venegerin fi tiştêkî ji min nepirsin. Lewra kezeba min diperite, dilê min teng dibe. Bi giramiyên xwe yên giran ez bi we re, dako!

Makar Devûşkîn

3ê Payîza Pêşin

Makar Alekseyevîç, ji ber kul fi kovana dilê xwe, min nama  
138

xwe ya dawdn ne qedand fi nîvçe lîşt. Carina ez dUsevim rewşeke wusa ku gelekî dixwazim bi tena serê xwe bimînim û têra xwe bigirîm. Dbcwazim xwe bi dest kul û xemgîniyan ve berdîm. Her ku diçe ev daxwaz U min zêdetn dibe. Di bîranînên min de ji bo min tiştên ewqas balkêş hene ku carina bi saetan ji xwe dfirdikevim fi tew haya min ji min nabe ku ez cUjîm jî. Hemû demên xweş û naxoş yên jiyana miu ya anuha, bîranînên jiyana min ya buhurî û bi taybetî jî bîranînên zaroktiya min ya rengîn tîne ber çavên min. Lê hertim jî piştî demên weha xemgîniyeke giran xwe dide ser min. Ez jar dikevim, xeyalên min, min ji hêle de dbdne fi her ku diçe saxiya min xirabtir dibe.

Lê îro, ji ber vê sibeha xweşik, zelal fi bi tava ku kêm caran li pajdzan dibin, ez jîndar bfim fi kêfxweşiyekê gjrte ser min. .  
Ango payîz hat ber derî! Li gund, min çiqas ji payîzê hez (U-

kir! Wê çaxê ez hîn zarok bfim lê pêjnên min gelekî xurt bfin. Min ji êvarên payîzê hez dikir. Tew ji bîra min naçe, bi çend gavan ji mala me dfir, li paş girekî golek hebû. Ev gola -anuha jî mîna ku H ber çavên min be- rast û fere, bi aveke zelal weke şfişe bfi. Ku êvaran ba nehata, pelên darên kêleka golê ne dilivyan, av jî bêliv fi weke neynikê dibiriqî. Hênikiyeke xweş digirte ser hawirdor. Avî U giyan dadihat, ronahiyên xaniyên U peravê vêdiketin, colên pezan vedigeriyan malê. Min jî wê çaxê hêdîka xwe ji malê vedidizî, berê xwe dide gola xwe fi min diçfi li wir çavên xwe kêfxweş dikirin. Li peravê, masîgiran hemêzek hejik dadidan û hUoriya ku ji agirê wan bilind dibfi, heta diir li ruyê avê belav dibû. Asimanê ku bi hêşînekî sar fi tarî, li hêla xwe ya roava periyên tîrêjên soravî dadixist xwarê fi pê bergeha golê dbcemiland. Gelek ne dibuhurî ev periyên soravî divemirîn û dfire jî heyv der(Uket. Hawirdor ewqas paqij û bêdeng dibû ku çfiçikeke veniciqî per U xwe bixista, zîlekî H kêleka golê bUeqiya, masiyekî xwe hUavêta ruyê

139

avê, ew ê bihata bihîstin. Ruyê ava hêşînokî bi mijeke tenik fi sipîçolkî dihate nixumandin. Aso tarî dibii fi nola ku hertiştên li dfir di nava ewrên mijê de biçine xwarê, hêdî hêdî wenda dibûn. Lê hemfi tiştên li nêzîk; kelek, perav, mitikên di avê de weke xwe reş dixuyan. Dfilikek ku H peravê jibîrbfiyî giran giran li ruyê avê dUeqiya, gUiyekî bîyê bi pelên zerbûjd li zîlên peravê aliqî bfi. Ji çîikên masîxur yeke derenketî racUbfi, xwe noqî ava sar dikir, dîsa biUnd difiriya û di mijdfimanê de wenda dibfi. Ji temaşe îî guhdarkirinê ez têr ne dibfim. Çi pêjnên

xweş îî bextiyar bfin! Û di wan deman de jî ez hîn zarokek bûm.

Ji payîzan, payîzên paşîn; dema ku êdî tene dikişin kewaran, karfibarên çolê diqede, ji bo şevbuhurkên şevan meriv H malan dicivine ser hev îî zivistanê dipên, min ewqas hez dikir ku!... Wê çaxê hertişt bi rengê tarî dihat nbcumandin, asiman ewrî dibû ii daristana rûtikî ji bergên zer tije dibfi. Ne-

maze

êvaran,

dema

ku

mijeke

nedaw

xwe

digirte

ser

daristanê, dar bi rengê hêşînekî tarî weke hiit fi şevreşkên tirsdar fi kambax derdiketin. Carina, dema ku U derve tariyê digirte ser me îî ez bêhay H dfi kesên pêşiya xwe dimam, wê çaxê bi tirs li xwe divarqilîm ku ez bi tenê me, weke pelekî diricifîm fi min gavên xwe bi lez davêtin. Ji hêlekê ve jî ez xwe bi xwe difikirîm fi min digot: «Lê anuha pîrebokek ji qulika qurmê wê darê derkeve!» Di wê gavê de heta ku jê cUhat, bayî xwe di daristanê de dibir û dihanî, bi êş û azar dinaliya îî dilorand, lepek berg ji gilîçekên mirî şîrop dikir ii ew li hewa dizîzikandin. Di pey re bi qîjeqîjên tiij fi kfivî, ji çfiçikan refekî wusa fere difiriya ku berê asiman reş dikir. A wê çaxê ji nişka ve dengê pistepistekê dihate bihîstin ii digot: «Bibeze

keça min, bibeze! Dereng nemîne! Bi qasekî din ev der ê bibe karesat! Zfi bUezîne!» Bi tirs fi xof heta ku bêhn U min diçiya, ez dibeziyam. Heta ku nun xwe davête malê, xwddanê di 140

ser min re diqeUband. Lê hundurê malê bi deng û şahî bfi. Hertim karek didane ber me zarokan, me baqUên xatûnî an jî xaşxaş ji per fi pfi hUdibijart. Êzingên bi rûn di hundurê sobê de bi qu-çeçiqirç dişewutîn fi diya min jî bi çavekî dilovane li me zarokan dinêrî ku em çawa bi kêfxweşî kar cUkin. Dadêya me ya pîr Ulyanayê jî çêlî demên berê dUcir, an jî xe\TOşkên U ser sêrbazî fi pîrebokan kat diku. Em zarok, me xwe bi hev ve dişidand, lê dîsa jî pişirîn ji ser lêvên me kême ne dibfin. Ji nişka ve em hemû bêdeng diman fi me digot: «Guhdar bikin, mîna ku yek li derî dide!» Lê kesekî li derî ne dbdst. Ev dengê ha, ji çendka pîrejina Frolovnayê dihat. Wê çaxê kenekî bi me digirt! Bi şev jî xewa şevan ne diket çavên me û her me xewnên xirab didîtin. Dema em ji xew şiyar dibfin, ji tirsan me newêrî bii xwe bUivanda fi herweha heta ronahiya sibê em di binê lihêfê de diricifîn. Sibehê em wck kuUkan jîndar radi-bfin ser xwe. Me di pencerê re li derve dinêrî: Ruyê erdan qeşa digirt, gilîdarên riit bi xwîsika sibehên payîzê dihate nixumandinê. Cemedeke tenik davête ser ruyê ava golê, hilmeke sipî jê bilind dibû ii hawurdor bi dengên çfiçikan dihate dagirtin. Royê tîrêjên xwe yên zelal fi sipî dadbdst ser cameda tenik ii weke şûşê perçeperçe dikir. Reng û ronahî, şahî li hawurdor belav dibû. Dema ku dîsa qirçeçiqirç bi agirê hundurê sobê diket, em jî H dor semawerê riidiniştin. Kfiçikê me î reş

Polkan bi awakî sarseqema êvarê xwarî, dihate ber pencerê,  
bi dostane boça xwe li ba dikir ii li me dinêrî. Gundiyeke ê li  
ser pišta hcspê xwe î xwedîkirî di ber pencera me re derbas  
bibîya fi biçîya daristanê êzingan. Herkes gelek şa fi kêficweş  
bû.

Dewsa bênderan tije komên gcnim dibfi û ev komên ku bi  
kayê sernbcumî, di binê tîrêjên royê de wusa dibiriqîn ku ça-  
vên merivan ji ber venedibû. Herkes gelek rUiet fi kêficweşê  
dajdna vê bereketa Xwedê bfi. Herkesî dizanî bii ku ew ê di  
141

çelê zivistanê de bê nan nemîne. Gundiyeke" herî xizan jî baş  
dizanî bû ku zariizêçên wî ê ji bîrçîna nemirin. Ji ber vê yekê  
jî êvaran dengê sitranên keçikan ne dihatin bhîn fi bi hev re  
diketine govendê, loma herkesî di van rojên Xwedê de bi  
hêsrên sipasdariyê li mala Xwedê dest vedigirtin fi ji Xwedê  
lava dikirin. Ax, zaroktiya min bi çi rojên bextiyar fi nexşîn  
buhurîn!..

Iro jî dema ez noqî van ramanên xwe dibim, weke zarokan  
dcst bi girî dikim. Hemû tiştên buhurî, jîndar fi weke xwe H  
ber çavên min in. Lê jiyana îroyîn bi min ve ewqas tarî fi şîlo  
dixuye ku! Dawiya viya ê bi çi awayî bibe, bi çi biqede? Lê  
hfin dizanin? Pêjneke wusa di dUê min de heye ku ez ê vê  
payîzê bimirim. Ez gelekî nexweş im. Her ez mirina xwe difi-  
kirim. Lê dîsa jî ez naxwazim bi vî awayî bûnirim ii têkevim  
binê vê xweliyê. Dibe ku weke buhara çûyî ez dîsa têkevUne  
nivînan û ji xwe ez hîna baş ne hatime ser xwe. Tew anuha  
rewşa min xirabtir e jî. Fedora îro ji bo karekî derket der û



heta êvarê venagere. Ez di mal de tenê mame. Ev serê wexte-  
kê ye ku dema ez bi tenê dimînîm, tirs li min çêdibe. Bi min  
wusa tê ku kesek di oda min de heye û bi min re dipeyive.  
Nemaze dema ku ez li ser tiştêkî dikevim ramanên kwîr û ji  
nişka ve li xwe divarqilim, a wê çaxê ez pir ditirsim. Ê ji ber  
vê yekê ez vê namê wusa dirêj dinivisînim, lewra dema ku ez  
dinivisînim, ev pêjna tirsê U min namîne.

Bi xatirê we! Ez nama xwe diqedînim. Lewra ne kaxeza  
min ma û ne jî wexta min heye. Ji wan perên ku min ji fnotma  
kinc û kofiya xwe girt, tenê rûbilekî min maye. We gelek baş  
kiriye ku du rûbil daye xwediya xaniyê xwe, bi kêmanî heta  
demekê ew ê dengê xwe bibire.

Bikin

ku

cilûbergên

xwe

hinekî

xweş

bikm,

Makar

Alekseyevîç. Di xweşiyê de bimînîm. Ez ewqas westiyayî me.  
ku, ez têngêhîjim bê ez çima wusa bêhêle ketime. Karekî he-  
142

rî piçûk jî min diwestîne. Ku anuha karek bi dest min bikeve  
jî, nizamîm ka ez ê çawa kar bikim. Ji xwe tiştê ku bêtir min  
tetirxanî dike jî ev e.

V.D

5ê Payiza Pêşin

Varenka, kevoka min!

Îro gelek pêjnên xirab H min rabfin. Beriya hertiştî heta êvarê serêşekê bi min girti bii. Ji bo ku hinek hêwa li ruyê min bikeve, ez derketim û berî berî kanala Fontankayê meşiyam. Êvareke tarî fi bi nedaw bfi. Êdî saet li şeşan tarî dadikeve erdê, weke anuha.

Baran nc dibarî, lê bi mijeke woisa bfi ku ji baranê ne kêmtir bii. Li ruyê asimên ewrên reş îfere li hev siwar dibûn. Kuça berî berî kanalê ji merivan dagirtî biî. Lê mîna ku peyva xwe yek kiri bin, ruyê hemiiyan jî xemgîn fi bêhtengîn bfi. Gundiyên serxweş, poznîkalên jinên fînî serqot fi bi potînên mêran, karker, duruşkevan, karmendên ku dibezin vir û wir... Zarokên kuçan ii wekîdin jî şagirtekî gwînvemirî bi saqoyekî xetxetî, ruyê wî ji rfin û teniyê hctikî ii di destê wî de kersegek... Efserekî kevn fi kinikî dbcwest çaqû îfexelekên tfincîn bifiroşe... A tevayiya merivên li wir, ji van kesina bûn. Wusa xuya bii di vê wexta êvarê de ji bilî babetên van merivan kes dernediketin derve. Fontanka, kanaleke bizavbar e! Hişê merivan di ber de naçe ku ewqas pir barkedek çawa li wir cî digirên. Jinên ku li ser piran rfiniştî biin, kulorên şilbûyî ii sêvên helisî difirotin. Ê ew bi xwe jî şil îfmirûztirî bii bûn! Gera li Fontankayê bêhna merivan teng dike. Kevirên ku di binê Ungan de hertim şil, li vî aliyî fi wî aliyî xaniyên bilind, reş fi

143

dfikelî... Di nav lingên te de mij, di ser serê te re mij... Bi kurtibir êvareke tarî ii xemgîn bii.

Dema ku ez zivirîm ser kuça Gorohovayayê tariyê xwe daxisti bfi fi dest pê kiri bûn êdî lampên kuçê vêdbdstin. Ev ji zfi ve ye ku min wext lê ne hanî biî ez dakevim vê kuçê. Kuçeyeke bi hingeme ye! Bi dikan fi konfeksiyonên dewlemend e, hundurê camekanên wan ji tiştên xweşik diçiriiskin: Qumaşên giranbuha, motîfên kulflkan û kofiyên bi qeytan... Meriv dibê qeyê xweşikiya vê pêşangehê radbdn ku tenê pê bala merivan bikişînin ser. Lê ne wusa ye. Bi rastî jî lawên bavan hene ku rewşa wan dest didin, van tiştan dikirin ii weke diyarî didine jinên xwe. Kuçeyeke dewlemend e! Gelek kulorpêjên alman jî di vê kuça Gorohovayayê de hene û xuyaye rewşa wan xweş e. Serî gavê duruşkeyek di vê kuçê re derbas dibe. Kevirên kuçê çawa li ber debar dikin, ez têngagêhîjim... Ev duruşkên ha gelekî xweşkok, hundurê wan bi şîfon fi hevrişîm, camên pencerên wan jî weke neynik diçirfiskin, malmezinên bi apoletên girikên piyan ii U kêleka xwe şidandine şfirê piştan.

Di navberan re min li hundurê duruşkeyan nêhnî, di hundurê hemfiyan de jî jinên bi kincên gelekî buha û xweşik rûnişti biîn. Dibe ku prenses ii kontes bfin. Diyar bii di saeta vê wextê de diçfine baloyê an jî civînên salonan. Ya rastî, min her-

tim

dbcwest

ku

ez

carekê

prensesekê

an

jî jmeke

ji

malmezinan weha ji nêzîk ve bibînim. Divê xwediyê xweşkiyeke bêhempa bin ew. Heta nuha jî min ne dîtîye, lê tenê dema ku duruşke di ber min re derbas dibfin, min weha çavêk lê digerland ii hew.

Lê wê çaxê ez we fikirîm. Ax, kevoka min! Her gava ku hfin têne bîra min, agir bi kezeba min dikeve. Çima bext wusa reş li we geriyaye, Varenka? Ka çiyê we ji xelkê kêmtir e, horiya min! Hûn dilovan, xweşik fi zana, çima bextreşiyêke wusa

144

girtiye ser we! Çawa meriveke weke we dUpak di tengasiyên dijwar de digevizin û bextiyarî jî diçe xwe bi xelkê ve dizeUqîne. Dako, ez dizanim bê fUcirîna wusa ne baş e, tiştên weha ramanserbestî ye. Lê em rasterast fi vekirî bibêjin: Çima yekî ku hîn di zikê diya xwe de ye kevoka bextiyariyê U ser eniya wî datê, fi yekî din jî di bêkesxanekê de çavên xwe U ronahiya dunyayê vedike? Pirî caran bextiyarî dibe para îvanûşkayê ehmeq(\*). «Erê, îvaniişkayê ehmeq, te çi qas cUvê, ji kîsên bav fi kalên xwe pera dendne, bixwe, vexwe fi kêfa xwe bike!... Lê filankesê reben, tu jî ji bu-çîna ziman U dora devê xwe bbdne! Para te jî ev e!»

Ez dizanim ev gunehkarî ye, dako, gunehkariyeke mezin e ku meriv weha bifikirin. Lê bêyî daxwaza xwe meriv dikevîne ramanên weha gunehkar. Ca bifikirin ku di hundiye-duruşkeyeke weha xweşUc de we seyran bikira, horiya min! Wê çaxê, ew mêzekirina we ya şêrîn ne tenê ji bo kesên weke min

peşmfirde, herweha ew ê ji bo generalan jî bibiiya nîşana ser-  
biUndiyê. Ji dêla ve kmcên lastîkotîn, we ê hevrişîm U xwe bi-  
kira fi hûn ê di nav zêran de bixemiliyana. Weke anuha hûn ê  
ne jar û gwdnvemirî, hfin ê weke bebikên şekirîn, weke gulekê  
jîndar ii topikî bibfiyana. Ku wê çaxê min jî U kuçê, di rona-  
hiya pencera duruşka we de çav li we bixista, ez ê bextiyar bi-  
biiyama. Wexta ku min bidîta hfin kêfxweş fi bextiyar dijîn,  
wê çaxê ez ê bi xwe jî bextiyar bibûyama, kevoka min.

Lê anuha! Mîna ku ew mabdrabiya ji destên kesên nerind  
têr nake, di ser de jî serseriyek radibe  
merivan piçfik di^dne.

Ji bo ku frakek H navmUê wî ye, xwediyê lorniyeta(\*\*) zêrîn e  
fi pê U xelkê dinêre; ji wî wetrê êdî mafê v/i heye ku hertiştî  
(\* ) îvanfişka: Dixevroşkên ûrisan de tîpekîgêj, ehmeq û bêkêr  
e. Lê şansê wîpir e. 'WW

(\*\*) Lorniyet: Çarçova berçavka yekçavîn e. WW

145

bike, bêşeref! Tu dibêjî qeyê xelk mecbûr in guhdariya goti-  
nên wî yên bêsinçî bike! Na, kevoka min, ewqas jî zêde ye! Û  
ev ji ber çi yekê ye? Ji ber ku hûn keçeke bi tena serê xwe fi  
aferîdeke bêsitare ne, we hevalekî xurt nîne ku bikani be we  
biparêze. Lê ev kesên ha çitor meriv in ku wusa bi rihetî ke-  
çeke sêwî piçîik dbdnin? Ez sond dixwom ku ev yên ha ne me-  
riv in, naxireke serserî û ehmeqên bêrfimet in ku heyîna wan  
jî bi xwe tuneiyek e. A qeşmerên weha ne ew. Lê ez ji we re  
tiştêkî bibêjim, delala min, îro ew laternabazê(\*) ku di kuça  
Gorohovayayê de ez lê rast hatim, di çav mm de ji wan gelekî

çêtir îî şerefmendtir e. Gerçê ev meriva ji bo çend quruşên nanê zikê xwe, heta êvarê cî bi cî her digere; lê ew, efendiyê xwe ye ii bi keda pî û baskê xwe dijî. Ew ji kesekî parsê nake, ji bo kêfxweşiya xelkê çî ji destê wî tê dike û weke makînekê vatiniya xwe bi cî tîne. Rast e, parsekekî reben e, lê parsekekî xwedîgiram e! Li gel ku ewqas diweste û ji sermayê diricife, lê dîsa jî ew li laternayê dbce. Gelek merivên weha şerefmend hene ku li gor kêrdarî fi pîvana karê xwe pir kêr peran distînin, lê destê xwe li ber kesekî venagirên û ji wan nan naxwazin. Ez bi xwe jî yekî wek wî laternabazî me, ango rasterast ez ne yekî wekî wî me, lê di aliyê tevger û kubariya xwe de ez jî wekî wî heta ku ji destê min tê, H bcr xwe didim. Gerçê ewqas tiştên zêde ji destê min nayê, lê evjî ne kêmasiyek e.

Ji ber ku min îro xizaniya xwe bi ewqasî din jî hîs kir, loma min çêlî vî laternabazî kir, dayik min. Ez U ber rawestiyam fi min temaşa wî kir. Gelek ramanên xemsar di serê min de civiya biîn ser hev fi ez jî sekinîm ku wan li xwe belav bUcim. Ji bilî min, çend duruşkevan, jineke ciwan, keçeke piçûk û gele- (\*) Laterna: // latînîtê. Babetekî orgê ye û bi badandina piyekî wê lêdikeve. Ê kesên ku wê lêdixe, me weke laternabaz bi navkir. WW

146

kî qirêjî dor U laternabaz girtin. Laternabaz H ber pencera xaniyekî cî dabii xwe. Di wê gavê de çavê min bi lawikekî piçûk ket. Pir pir dehsalî bû, ku ne ji nexweşî û jarketina wd bûya, ew ê lawikekî rindikî bixuya. Qutikekî piçûk û tişteki din jî li xwe kiri bû. Pêxwas bfi, bi devekî vekirî fi kêfxweşiya zarokekî

guhdariya muzîkê dikir. Kiiiklayên(\*) ku alman î sazband cU-  
da reqisandin, vî zarokî jî devê piyê qutikê xwe gez dikir, diri-  
cifî û bi baldariyeke wusa li wan dinêrî ku tew hay jî ji dest û  
lingên xwe yên qerisî tune bû. Bi ber çavên min ket ku perçe-  
kek kaxez di dest de bfi. Di vê navberê de efencUyek derbas  
bfi î jî bo sazband perekî hesinî havêt, pere çû kete qutiyeke  
piçîik, qutiya ku kfiklayan li dorê dans dikir. Wek pêşanda-  
nek ku mêrekî fransî bi jinan re dansê bike. Çer ku şingîniya  
peran hat bihîstin, ev dergîîşa ji nişka ve hay ji xwe bfi û bi ça-  
vên veniciqî li dora xwe nêhirî. Xweş diyar bfi ku ji wî wetrê  
ew perê ha min havêti bii, loma bi bez ber bi min hat. Dema  
kaxez dirêjî min kir, destên wî yên piçîik dilerizîn fi bi denge-  
kî nîvxeniqî got: Name.

Min name vekir fi xwend. Çîrokek ku em pê dizanin: Dayi-  
kek li ber nexweşiya mirinê ye. Sê zarokên wê di mal de dikin  
ji birçîna bimirin... «Destên xwe yên xêrê dirêjî me bikin, ji bo  
ku hûn xêrendarên dilovan li vê dunyayê zarokên min jî bîr  
nakin, dema ku ez bimirim H wê dunyayê ez ê jî we ji bîr ne-  
kim...» Ev rewşeke vekirî bû û pirî caran xwe H jiyanê dide  
der. Min ê çi bidayê? Herweha H gel ku dUê min pir pê şewu-  
tî, min tiştêk jî ne dayê. Bêguman ev dergûşê reben î ku bi zi-  
kê birçî, ji sermayê reş fi mor bfi bû, derew ne dikir, ez pê  
dizanim. Lê tiştê herî xirab jî, ev dayikên bêxêr parsnamekê  
dbdne destên zarokên xwe fi di vê sar fi sermayê de nîvtazî  
(\*) Kfikla: Bûkikên ku bi alîkariya ben û taji hêla kûklabazeki  
ve têne hejandin, leqandin an jî reqisandin. WW

berdidine nava kuçan. Dibe ku ev dayika ha, jineke ehmeq î bêcir be. Dibe ku kesekî wê tune be fi H quncikekî liogên xwe dabe ser hev fi riinişti be, fi dibe ku bi rastî jî nexweş be. Ku wusa be, divê ew berê xwe bide sazgehên pêwîst. An jî dibe ku rasterast jineke xapînok e, heta ku zarok bi rastî jî nexweş bikeve, ew wî dergfişî weha jar û birçî bera kuçê dide ku pê xelkê bixapîne.

Bi gerandina parsnameycke weha, ev dergiişa ê hînî çî bibe? Ew ê ji wir bazde wir, çav li destê xelkê parsê bike fi diire ji merovatiyê derkeve. Lewra xelk di ber re derbas dibin fi kesek bala xwe nade wî. Dilên wan hişk weke kevir û peyvên wan tal in. «Bicahime ji vir! Ji vir rabe, nerindê nerind!» Ev dergiişa, ew ê ji herkesî van peyvikan bibihîse, dilê wî ê bibe weke kevir, mîna çêlê çfiçikek ku ji hêlîna xwe hati be hecirandin ii keti be xwarê, ew ê li ber sermayê bêtir biricife. Dest ii lingên wî ê biqerisin fi bêhnfetiskî bibe. Dûrc jî ew ê dest bi kuxikê bike fi di demeke kurt de nexweşî ê wek marekî jahrîn xwe di sîngê wî dc kuloî bike. Paşîngê di quncikekî de bê alîkarî, bê dilovanî li ber mirinê ye ii êdî mirin jî li paş serê wî ye. A tevayiyê jiyana wî jî ev e! Ax, Varenka! Bi rastî jî jiyan carina gelekî bêbext dibe. Rebenekî weha, destê xwe U ber merivan vegirê fi bibêje, «Ji bona Xwedê!» ii meriv jî di ber re derbas bibe, tiştêkî ncdinê fi tenê bibêje, «Xwedê bide!» çî tiştêkî tal fi dilêşîn e! Hinek ji van "ji bona Xwcdê"yan ji dil têne gotin. (Ev gotinên "Ji bona Xwedê" jî babetên xwe hene, dako.) Hinckî wan jî bi nalîn ii bergerên lihevhanîna parsekiyê ne. Meriv di ber yekî weha re derbas bibe ii tiştêkî nede wî jî, meriv U ber nakeve. Mcriv ê bifikirc û bibêje, kevn



û bêrfi ye, ev tiştta ji xwe re kiriyc kar fi ji heq xwe derdikeve. Lê "Ji bona Xwedê" yeke din jî heye ku dafirî aqUan e fi bi dengê hişk û kambax tê gotin. îro dema ku min parsnama lêwik ji dest girt fi lê dinêrî, U ber dîwarê hewşê merivek rawestiya

148

bû. Ji herkesî ne dixwest. Ji min re got: «Ji bona Xwedê kopêkekî bidine min, ezbenî!» Ev dengê wî bi awakî wusa lerezok û bbcbixokî derket ku ez bi tirs veciniqîm. Lê rain tişteke ne dayê fi ji xwe tune biî jî. Ê ji bilî viya, dema ku xizan bi dengê bilind gazinên sernî^asa xwe dikin, bi kesên dewlemend naxoş tê. Ew vê yekê wek carisiyeke bêhtengîn fi nerihetiyekê dibînin.

Xizanî, hertim ji bo yên din nerihetiyê peyda dike. Ê li kuderê dengê nalîna zikên birçî were, li wir xewên zikê têr diherime!

Lê ez ji we re vekirî bibêjim, dayika min, bi nivisandina van hemî tiştan, ji hêlekê ve dbcwazim dilê xwe vala bikim fi nemaze ji hêlekê ve jî dixwazim başiya stUa niviskariya xwe pêşanî we bidim. Divê hfin jî tégêhîşti bin ku di van demên dawîn de êdî ez ramanên xwe baştir li ser kaxezê formule dikim. Lê anuha di vê gavê de bêhna min ewqas teng e ku min bi xwe jî baweriya xwe bi ramanên xwe hanî. Li gel ku ez dizanim bê ev pîvana ha bi kêrî tişteke nayê, lê bi kêmanî têr dike ku ez heq bidime xwe û xwc bêguneh bibînim. Bi rastî jî pirî caran bê cî ii bê sedem ez xwe piçîik dbdnim fi rfimeta yekî pêncpereyî jî di xwe de nabrîm, berxika min. Ku ez wek

nimiîne bidim ber hev fi bibêjim: Sedema vê yekê, dibe ku ez jî wekî wî zarokê ku ji min sedeqe xwest, hati bim tirsandin ii êşandin.

Guhdar bikin, dako! Anuha ez ê ji we re gelek tiştên mecazî binivisînim. Sibehan dema ku ez bi lez berê xwe didim buroyê, carina li bergeha bajar dinêrim ii noqî ramanan dibim. Dema meriv dibîne bajar dest pê dike fi hêdî hêdî şiyar dibe, radibe ser xwç, diikel bi rocinan dikeve, hawirdor bi deng fi qêrîn jîndar dibe; di demên wcha de mîna ku meriv sîleyek ji yekî xwari be, an jî yekî pozê meriv kaş kiri be, meriv bi tirs fi guvişîji wir diirdikeve. Wek ku meteloka ûrisan dibêje, meriv «ji avê bêdengtir fi ji zirçê nizmtir» dibe, dikeve riya

149

xwe îî nizane ew ê li ser çi bifikire. Ka bifikirm bê anuha di hundurê wan xaniyên ku ji teniyê reşbûyî de çi tişt dibin. Wê çaxê êdî hiin bi xwe biryara xwe bidin ka çiqas heqê merivan heye ku xwe wusa piçîik bibîne ii daxîne nizmiyeke weha. Baş bala xwe bidin ser, Varenka, li vir ne bi maneyeke rasterast lê ez bi awayekî mecazî dipeyivim!

Ka em binêrin bê di hundurê wan xaniyan de çi diqewiune. A li wir, ji tunebiina xanî, di kozikeke bi dfikel fi nedaw de anuha esnafekî piçfik hîna nfi ji xew şiyar bfiye. Rebeno, heta sibê xewna -ji xirabî re mîna ku tişteki din ne ma be ku têkeve xewna wî- potîne dîtîyc, potîna ku rojekê berê di dest xwe de bi çewtî ruyê wê birîye. Lê wek em dizanin ev meriva koşkar e, û pir jî normal e ku şev ii roj U ser erbabiya vî karê xwe bifikire. Zarokên wî dikine mizemiz fi jina wî birçî ye. Ê ke-

sên ku di rewşên weha de şiyar dibin, ne tenê koşkar in, dako. Ku wusa bfiya, meriv ê çêl nekira ii pêwîst ne dikir meriv binivisanda jî. Lê rastiya vê yekê tew jî ne wusa ye, dako. Efen-diyekî gelekî dewlemend jî dikane wê şevê, di wê avahiyê de, li qatekîjêrtir an jî jortir, di maleke pir xweşik de xevraa cotek potîn bibîne. Lê bi awakî din, babetên potînan wekîdin e, lê dîsa jî potîn in... Lewra tiştê ku ez dizanim fi dixwazim bi we bidime zanîn; kê m zêde em hemû jî koşkar in, dako. Ya rastî, ev jî ne xem e. Tiştê xirab ew e, li ba wd efendiyê dewlemend kesek tune ku di guhê wî de bibêje: «Dev jê berde! Tenê xwe

ii jiyana xwe nefikire!

Tu ne

koşkarek î.

Saxiya

zarokên te li cî û jina te ne birçî ye. Ca U hawurdora xwe binêre, ma tu ê ji xwe re ji cotek potîn hêjatir mijareke din nebînî?»

A tiştê ku min dbcwest ez bi awakî mecazî ji we re bibêjun, ev bii, Varenka. Dibe ku ev ramanên ha gelekî serbest werm, lê carina ev ramanên ha têne hişê min, di agirê dUê min de dibine peyvik fi bêjd daxwaza min dnijin. Ya rastî, ne pêwîst e

150

ku meriv ji şiyarbûna bajêr veciniqe ii xwe weke nuxtikekê bibîne. Di dawiya gotinên xwe de ez dixwazim viya jî ji we re bibêjim,  
dako,

bawer

nekin

ku

min

ev

hemii

tiştên

ha ji

bêhtengiyê ji ber xwe havêtiye, an jî ji ber pirtûkekê nivisîye.

Na dako, bawer nekin,

wê çaxê hûn ê bbcapin. Lewra ez de-

rewan nakim karê xwe, bêhna min teng ne bûye û min ji ber pirtûkekê jî ne girtiye.

Ez bi awakî pir xemgîn hatim malê, li kêleka masê riîniştim, min semawer amade kir ku ji xwe re kasîkek çay vexwum. Ji nişka ve min dît ku ev rebenê kbêdarê me Gorşkov kete hundur. Ji xwe vê sibê bi ber çavên min keti bû ku ew çawa li dor wan kirêdarên din digere fi dbcwaze xwe nêzîkî min bike. Beriya ku ez derbas bim, viya jî bi we bidime zanîn ku rewşa wî ji ya min pir ii pir xirabtir e, dako. Agir bi kezêba meriv dikeve! Ji hêlekê ve jina wî, ji hêlekê ve jî zarokên wî... Ya rastî, ku ez di dewsa Gorşkov de biîma, ez nizanim bê min ê çi bikira.

Bi kurtî Gorşkov silav da min î derbasî hundur bfi. Weke hertim bijangên wî şilî bfin. Lingên xwe di erdê re dida, dikir ku tiştêkî bibêje, lê peyvîkek jî ji devê wd dernediket. Min sandaliya xwe keremî wî kir ku rfine. Ya rastî, sandaliya min şikiyayî bii, lê wekîdin jî tune bfi. Min kasîkek çay jî keremî wî

kir. Pêşiyê dûrfidirêj doza lêborînê kir îî ne xwest vexwe, lê di dawiya dawîn de kasik girt. Kir ku çayê bê şekir vexwe. Dema min li ber da ku ew şekir bigirê, dîsa dest bi lêborîna xwe kir, çavê xwe li perçê şekirekî herî piçûk gerand, ew girt ii kire çaya xwe. Lê dîsa jî dikir û dbcwest ez pê bawer bikim ku çaya wî gelek fi gelek şêrîn e. Meriv dibîne bê xizanî merivan çiqas piçûk dixîne!

Min pirsî fi gotê:

- Êê, dostê min çi heye, çi tune?

- Derbas dibe fi diçe, got. Lê gelek xirab e, xêrdarê min,

151

Makar Alekseyevîç! Ji bona Xwedê alîkariya maleke bêhîvd bikin. Jina min, zarokên min birçî ne ii hfin dizanin bê ev yeka ha ji bo bavekî çi tiştêkî dilêşîn e!...

Min kir ku ez tiştêkî bibêjim, lê wd peyva min birî û got:

- Li vir, ez ji herkesî ditirsim, Makar Alekseyevîç. Ya rastî, natirsim, lê şerm dikim. Hemii jî wusa qure û pozbilind in.

Min ne dbcwest ez we jî nerihet bikim, birakê min î xêrdar. Ez dizanim destê we jî teng ii rewşa we xirab e, hfin ê nikani bin zêde alîkariya min bikin. Lê ji bona Xwedê hindik be jî tiştêkî bi deyn bidine min! Min hay jê heye ku destê we bi xwe jî teng e ii rewşa we hîn serast ne bfiye, lê ez bi dUpakiya we dizanim ii ji ber vê yekê min xwe li we girt fi ez hatim. Hêvîdar im ku hfin ê li min, li vê tevgera min ya naxoş biborin, Makar Alekseyevîç.

Min pê da zanîn ku min ê ji dUfican alîkariya wî bikira lê ez jî bê pere me, pênc perê min jî tune. Wî gotinên xwe do-

mand ii dîsa got:

- Xêrdarê min, Makar Alekseyevîç, ez daxwaza tişteki zêde ji we nakim. Ewk e... jina min ii zarokên min (Li \dr soromoro bii.) hemii jî birçî ne... Ji bona Xwedê çend kopêkan bidine min!

Agir bi kezeba min ket û xwe bi xwe fikirîm ku rewşên ji rewşa min xirabtir jî hene. Lê ji bilî bîst kopêkan perê min tune bfin û ew jî ji bo malê biin. Bi wan, min ê sibê pêwîstiyên xwe yê herî girîng bikiriya.

Min gotê:

- Na, dostê min, ez nikanim bidim.

Min dikir ku ez sedema nedajdna xwe jê re bi lêv bikim, lê ew her li ber min digeriya î digot:

- Xêrdarê min, Makar Alekseyevîç! Çi ji destê we tê, wd bidin... bi kêmanî deh kopêkan!...

Ji bo ku bibe çêyîyek fi bi kêrî tişteki were, min rabfi bîst  
152

kopêkên xwe ji sandoqê dendst û da wî, dako. Ev çi xizanî ye, Xwedê! Ez fi Gorşkov, em hinekî bi hev re ketin galegalê.

Min jê pirsî û gotê:

- Çawa bfi ku hûn ketin vê destengiyê, dostê min? Ê hiin ê çawa bikani bin mehê pênc rûbilan kirêya xaniyê xwe bidin? Li gor gotinên wd, wî ev xaniya ji bo şeş mehan kirê kiriye fi kirêya şeş mehan jî pêşîn daye. Bfiyerên ku (U serê rebeno de hatine, ew gêj kiriye û nizane bê ew ê çi bike. Anuha U bendî safîbfina dozekê ye, hêvî dike ku doz heta wê çaxê safî bibe. Karekî serêşîn e. Hfin dibînin, Varenka, dadgeh lê rabfiye xe-

zebê. Tevlihevî doza bazirganekî bûye. Bazirgan, di karekî dewletê de fêlbazî kiriye. Ev fêlbaziya wî derketiye rastê û bazirgan dane dadgehê. Mêrik jî rabiiye ev fêlbaziya xwe kiriye ser Gorşkov. Ya rastî, di vê yekê de ji biU sersarî û teraliyê tu gunehkariya Gorşkov tune. Gunehkariya wî ew e ku nikani bûye tiştên dewletê biparêze. Ev çend sal in ku ev doza dadgehê didome fi bi vê dozê re gelek giUyên din jî U dijî Gorşkov hatine kirin.

Gorşkov ji min re dibê: «Buhtan U min dikan û ev fêlbaziyên ha gelekî ji min dfir in. Min ne pere dizîne, ne jî ez beşdarî fêlbaziyên bfime.»

Lê dîsa jî bi vê yekê çilkên qirêj pijiqîne wd fi ew ji kar havêtine. Herçiqas rasterast tawanbar dernekti be jî, heta ku dadgeh nebêje erê, wan perên ku ew ê bi riya dadgehê ji bazirgan bistînin, ew ê nikani be bigirê. Ez bi rastiya gotinên wî bawer dikim, Varenka. Lê ji bo dadgehê ev gotinên wî tenê têr nakin. Ev doza jî weke porekî lihevketî ye û diyar e ku heta sed salan jî ji hev safî nabe. Dibêjin, dema doz piçekî ber bi safîbfinê diçe, bazirgan ji nû ve tevUheviyekê derdixe. DUê min gelekî bi Gorşkov di^ewute û dixwazim bala min U ser wî be, dako. Karê mêrik ji dest girtine. Ji ber vê çUka qirêj kesek baweriya xwe pê nayine fi kar na(Une wî. Çend qiu-uşên ku ji

153

xwe re li vir fi wir dane ser hev jî, xwarine fi qediyane. Dadgeh diîr dikişîne, jê re wext divê fi di vê wextê de divê meriv bijîn jî. U di ser de jî bê cî ii bê wext zarokekî wan çêbfiye. A ji te re mesrefeke din! Lawik bijî mesref, bimire dîsa mesref -

mesrefên nû! Jina wî nexweş e, saxiya mêrik bi xwe jî ne li cî ye, êşa nesaxiyeke kevn pê re heye. Bi kurtî, serê mêrik her bi derd û kul e. Li gor gotina wî, ew dipê ku di van rojan de dozê bi awakî baş safî bibe ii ji vê yekê şika wî tune ku ew ê dozê qezenc bike. Dilê min gelekî bi vî merivî dişewute, dayika min, gelekî! Min dilê wî hinekî xweş kir. Merivekî êşiyayî ii tirsiyayî ye, bext fi sitarekê divê û loma min jî xwe nêzîkî wî kir.

De bi xatirê we, dako! Xwedê bi we re be fi daxwaza min saxiya we ye, kevoka min! Her gava ku ez we bi bîr tînim, mîna ku ez dermanekî bidun ser ruhê xwe î nexweş, ewqas cansifik dibim. Li gel ku ez ji bo we dêşim jî, ev yeka bi min giran nayê.

Dostê we î dilsoz

Makar Devûşkîn

9ê Pajdza Pêşîn

Dayika min, Varvara Alekseyevna!

Anuha dema ez van rêzikan ji we re dinivîsînim, hişê min ne li serê min e. Bfiyereke nepajd ez tevlihev kirim. Hişê min diçe ii ez hemii tiştên H dora xwe serfîbinî dibînim. Ax, dergîşa min, binêrin ez ê ji we re çî kat bikim! Tişteki weha qet ne dihat ser hişê min. Lê dîsa jî ez bawer im gumaneke weha U min çêbii bii. Min ev hemfi tiştên ha di dilê xwe de hîs kiri bfi fi tew bi çendekî beriya nuha min tişteki weke viya (U xewna 154

xwe de jî dîti bii.

Binêrin bê çawa bû. Bêyî rast fi serastkirin, çawa biiye, ez



ê ji we re wusa kat bikim. îro ez çim buroyê, rûniştim fi min dest bi nivisandinê kir. Nivisara ku do nîvçe ma bfi, min xwest ez bidomînim û biqedînim. Tîmofey îvano\dc do hati bfi, ew dabfi min fi goti bfi: «Makar Alekseyevîç, ev kaxeza ha gelekî girîng e, divê hfin zii viya pak binivisînin. Divê pir paqij fi bi baldarî bête nivisandin. Ew ê îro biçe îmzê.»

Horiya min, divê ez viya jî bibêjim ku do ez tew ne li ser xwe biim ii çavên min ne dixwest tiştêkî bibîne. Xemgînî fi bêdiliyeke giran xwe girti biî ser min. Dilê min sar fi ruhê min reş bii. Her hûn li ser hişê min bfin, ruhuka min. Min kaxez kişand ber xwe ii dest bi paknivisê kir. Min gelek xweş ii paqij dihisivî. Ez nizamim bê çawa bii. Ya rastî, an şeytên tiliya xwe xiste nav an jî hêzeke yezdanî xwe xiste nav fi xwest wusa bi-be. Çawa bibêjim, bi awayekî min di ser rêzekê re gav kiriye. Û Xwedê dizane bê ew hevoka êdî tê çî manê, fi dibe ku qet mana xwe tune be jî. Karê paknivisê do heta derengî şevê hajot ii ji bo îmzekirinê îro derxistin pêş ekselans. Mîna ku tew tiştêk ne biî be, wekc hertim ez di wexta xwe de çûm buroyê fi H kêleka Emelyan îvanovîç rfiniştim. Bendka min, divê ez viya jî bi we bidime zanîn ku ev piştî demekê ye ku şermokiya min bi ewqasî din jî zêdetir bfiye û heta ku ji destê min tê ez xwe vedikêşim ser hev. Di van demên dawîn de ez nikanim li ruyê kesekî binêrim. Ku sandaliya yekî bike qirçeqirç, bi tirs diveniciqim fi gwîn li min zer dibe.

Û îro jî wusa bfi. Ez ji xwe re bêdeng rfiniştî bfim û min nola jijo xwe di ser masa xwe ya nivisandinê de xwar kiri bû. Di wê navberê de Yefîm Akîmovîç (Firçfizekî wusa ye ku kesî U dunyayê ne dîtiye!) bi dengêkî wusa bilind:

«- Makar Alekseyevdç, hfin wusa rûniştine mîna ku gur ê we bbcwe!» got ku di tevayiyê salonê de hat bihîstin. Bi vê go-  
155

tina xwe re miriîzê xwe woisa tirş û tal kir ku hemfi kesên H wir ji ken ketin. Bêguman rasterast tinazên xwe bi min diki-  
rin. Dawiya kenê wan ne dihat. Min guhên xwe xetimand, çavên xwe girt û bêliv di ciyê xwe de rfiniştim. Xwiye min e ev, dema ez wusa dikim, ew zîûtê- dev ji min berdidm. Ji nişka ve dengê gurmegurm, bazdan ii dilpekînê dibihîsun... Bi min wusa hat ku yek banî min cUke. Na xwe guhên min bi min çewt didine zanîn? Min bihîst ku navê min hUdan û banî Devîşkîn kirin. Gurpegurpekê bi dUê min girt, ez bi xwe jî nizamim bê ez ji çi ditirsiyam. Lê tiştê ku ez dizanim, di tevayiya jiyana xwe de ez nola vê carê ne tirsiya biim. Ez bi sandaliya xwe ve zeliqî ma bfirm û mîna ku tew ne ez bim. Lê her ku çû, dcng fi teperep nêzîkî min hatin. Gelek ne buhurî di bûiê guhê min de dengê çingiya:

«- Devfişkîn! Devûşkîn! Devûşkîn H kuderê ye?»

Dema min çavên xwe vekirin fi ber bi jor nêhirî, Yestafî îvanovîç li pêş min bû:

«- Makar Alekseyevîç, got, zî derkevin pêş ekselans, gazî we dikin. We di paknivisê de çewtiyeke mezin kiriye.»

Zêdetir tişteke ne got, lê têra min kir, dako. Di ciyê xwe de sipiisar biim, xwîn li min ziwa bfi. Bi awakî gêj fi nîvmirî ez rabûm çim. Wan, ez di du odeyan re derbas kirim ii di oda si-  
siyan de min dît ku ez li hafa ekselans im. Ez ê nikani bim bi awakî rastîn bi lêv bikim ka di wê gavê de ez çi difikirîm. Min

serê xwe rakir; ekselans H ser pêyan bfi, yên din jî hemû li do-  
ra wî bfin. Xwedê dizane min ji bîra kir ku ez sUavê jî lê hil-  
dim. Ji tevliheviya xwe lêv fi çogên min dUerizîn. U ev ne  
tişteki bêsedem biî, dako. Beriya hertiştî min gelekî şerm kir.  
Lewra di neynika hêla rastê de çavên min bi min ket û ew  
bergeha ku min tê de dît, bi rastî jî meriv jê dîn dibûn. Ya du-  
duyan, ji bo ku ez bala kesekî nekişîname ser xwe, heta ku ji  
destê min hat, min kir. Xwedê dizane haya ekselans jî ji hejd-  
156

na min tune bû. Dibe ku bi ber guhê wî keti be ku di debarte-  
mentê de karmendekî bi navê Devfişkîn heye, lê tu carî jî ez  
wusa derneketi biim hafa wî.

Ekselans bi rewşeke hêrsbûyî:

«- Ev çi kar e, efendî? Ma hişê we li ser çi ye? Dokumen-  
tekî girîng bii û diviya bfi di wexteke kurt de jî pêre bigîha, we  
herimandiye. Ma ev wusa dibe?»

Li vir ekselans zivirî ser Yestavî îvano\dc. Gotinên weke,  
«sersarî!... nankorî!... serêşiyê ji min re peyda dikin!» dîsa di  
guhên min de çingîyan. Min devê xwe vekir ku tişteki bibêjim,  
daxwaza lêborîna xwe bikim, lê ne bii. Min kir ku ez ji wir bi-  
revim, lê min newêrî bfi. Di wê gavê dc.belê, cU wê gavê de  
tişteki wusa bû ku ez anuha jî ji ber wê yekê şerm dikim. Bi-  
şkova min -di erda reş keve!- bişkova min ya ku U ser tayekî  
zirav bi çakêtê min ve ma biî, ji nişka ve filitî, (Xwedê dizane  
min baş pê ve ne dirfiti bfi.) kete xwarê û di bêdengiya odê de  
bi şingînî heta ber lingên ekselans gêr bfi, bêyom! Şirova ku  
min ê bikira, lêborîna ku min ê bixwesta fi ew bersiva ku min

ê bida ekselans, vê yekê dewsa hemfiyan girt. Dawd xirab bii, ekselans hûr hiir bala xwe da pergala îlîbergên min. Ew bergeha min ya di neynikê de hat bîra min. Serê min gêj fi ez tevlihevî bû biîm. Ez xwar biim fi min kir ku ez bişkovê bigirim. Lê her dipengizî, gêr dibii îlî min nikanî biî ew bigirta. Bêkêriya min bi her awayî derketi bû rastê. Wê çaxê min hîs kir ku hêza min ya dawîn jî êdî pişta xwe bi min de kir fi tiştê ne ma. Navûdengê min xirab bfi, şerefa min şikiya. Di guhên min de dengina diçingiyana ji min weatrê dengê Faldonî îlî Terezayê dihate min. Di dawîya dawîn de min bişkov girt, rabfim ji min xwe serast kir. Qaşo ez ê rabiiyama, min ê destê xwe H pêş xwe bida ser hev û rawestiyama, lê ez rabiiim wek ehmeqekî min fikir ku ez wd tayê filitî di bişkovê re bikim. Mîna ku ez ê bikani bun pê ve bizeliqînim!... Û di ser de jî

157

min didanbeşî fikir, weke ehmeqan ez dipişirîm! Ekselans pêşiyê berê xwe bi hêla din ve kiri bfi, lê dûre vejeriya fi cUsa li min mêze kir. Min bihîst ku ji Yestafî îvanovîç re dibêje:

«- Ev çi ye? Ca li pergala viya binêrin?»

Ax, dako, êdî baş hati bû famkirin bê ez çi meriv im! Vê carê jî min bihîst ku Yestafî îvanovîç dibêje:

«- Tevgereke wî ya xirab ne hatiye dîtin. Karmendekî me îlî nemiinegîn e. Perê ku distîne jî ne hindik e.»

«- Dîsa jî divê meriv alîkariya wî bikin, serqisê avansê bidinê...»

Yestafî îvanovîç bersivand fi gotê:

«- Belê, ezbenî, ji xwe perê xwe yê çend mehan pêşîn gir-

tiye. Xuyaye rewşa wî xirab e, an ne, karmendekî me î nimfi-negîn e fi tu carî ne biîye mijara giU û gazinan.»

Dema ev yên ha weha dipeyvîn, agu-ekî bi laşê min girt; ez dimirim, difetisîm, horiya min!

Ekselans vê carê bi dengekî bilind got:

«- Baş e, ev nivisara divê ji nii ve bête nivisîn ii heta ku ji we tê bêçewtî fi zû bikin, Devfişkîn.»

Li vir ekselans vejeriya ser ew yên din, çend tişt ji wan re got û hemû derketin çûn. Bi derketina wan re ekselans dizdanê xwe derxist, zûziika banknotekî sedrfibUî girt, xiste destê min ii got:

«- Tiştê ku ji destê min tê, ev e. Viya bigirên, we çawa divê wusa bigirên!»

Di wê gavê de ricifiyekê bi laşê min girt ii ez veniciqîm, horiya min. Ez nizanim bê çawa bfi bû, lê min xwest ku ez xwe bavêjim destê wî fi maç bikim. Ca bifdcirin, horiya min, ruyê wd soromoro bii (Ne kême ne zêde, bawer bUcin ez rastiyê dibêjim, horiya min.) û ev destê min î bêrûmet gnt fi şidand, mîna ku destê hemsalekî wî be, yê genarelekî be!

«- Dc anuha biçin, got. Tiştê ku ji destê nun hat... Ji vir

158

weha çewtiyan nekin! Wan kaxezên berê biçirînin ii bila vê carê weha be.»

Anuha ez gêh<sup>^</sup>tim birayareke weha, dako. Ji we ii Fedo-rayê re dibêjim; ku zarokên min hebiiya, min ê ji wan bbcwesta ku bila wan her roj ji bo ekselans banî Xwedê bikirana, ne ji bo min. Ji diliican dixwazim tişteki din jî ji we re bibêjim,

dako. Baş guhdar bikin. Ez ji we re sond dixwim ku li gel wê hemfi destengî û tunebûna ku ez tê de diqepijîm û ji bîra min naçe, lê dîsa jî riimeta wê tevgera ku ekselans bi destê min girt û şidand, ji dayîna wî sed rfibilî berztir e. Lewra wî bi nef-spîçûkî destê min î bêrûmet şidand. Ez yê ku meyxurekî bi qirşekî kayê jî nakim! Bi vê tevgera wî, baweriya min li min vegeriya, jîndarî kete ruhê min î jiyana pêşerojê bi min şêrîn hat. Gunehkariya min çiqas mezin dibe bUa bibe, ji bo saxî ii bextiyariya ekselans lavan dikim î bêguman ev daxwaza min ê bigêhîje Yezdanê dilovan.

Dayika min! Anuha pêjnên tevlihevî ii dUpekiyeke mezin girtiye ser min. Dilê min wusa hildavêje, mîna ku defa sîngê min perçe bike. Dest fi pê li min sist bfine û hêle di min de ne maye. Çel fi pênc riibilan ji we re dişînim. Ez ê bîst rfibilan bidime xwediya xaniyê xwe î sî ii pênc riibilan jî ji xwe re di-hêlim. Ez ê bîst rfibUan ji bo cilîbergên xwe bidim fi panzdeh riibilên mayî jî ez ê pê debara xwe bikim. Biiyera vê sibê ez serûbinî kirime. Ez ê xwe dirêj bikim î parîkî bêhna xwe bigirêm. Lê nebêjin qeyê nexweş e. Tenê wusa dilê min dêşe, mîna ku tiştêk

di

hundurê

ruhê

min de

dUerize,

diricife ii

dipirpite. Ji sedî sed ez ê werun mala we. Lê ji ber van hemii pêjnên ha, anuha ez rasterast sermest ketime. Xwedê hertişti

dibîne, dako, kevoka min ya bêhempa!

Dostê hêjayî we

Makar Devûşkîn

159

IOê Payiza Pêşin

Makar Alekseyevîçê giranbuha!

Ji vê bextiyariya we, ez jî gelekî fi gelekî kêfxweş bûm. Ez jî têgêhîştîm bê amîrê we merivekî çiqasî dUovan e, dostê min. Na xwe malkambaxî dest ji husukura we berdide êdî! Lê ji bona Xwedê ji vir û weha dîsa perê xwe li avarê xerc nekin. Bi nefspiçîikî ii heta ku ji we tê, destê xwe di ber perên xwe re bigirin. Ji îro ii pêve carê çend quruşan cU quncikekî de bidinc ser hev ku hiin dîsa ji nişka ve nekevin destengiyekê. Ji bona Xwedê ji bo me nerihet nebin! Bi çî awayî be jî ez û Fedorayê, em ê debara xwe bikin. We çima ewqas zêde pere ji me rc şandine, Makar Alekseyevîç? Tew pêwdst ne dikir. Tiştê ku di destê me de hebfi, têra me dikir. Gerçê dema ku em ji vir bar bikin, pêwîstiya me ê ji peran hebe, lê Fedora bi hêvî yc ku ji dcyndarekî kevn perê xwe bistîne. Ji ber vê yekê, bo rewşên pêwîst ez bîst rûbUan werdigirim fi yê mayî dîsa li we vcdigerînim. Destê xwe cU ber perên xwe re bigirin, Makar Alekseyevîç. Bi xatirê we! Êdî di xêr û xweşiyê de bijîn! Min ê ji we re zêdetir binivisanda, lê ez gelekî westiyame. Do heta êvarê ez ji nav nivînan ranebfim. Ez pê kêfxweş bûm ku we soz da û hfin ê werine vir. Bi çî awayî dibe bUa bibe, werin serlêdana me, Makar Alekseyevdç!

VD

Ilê Payîza Pêşin

Delala min, Varvara Alekseyevna!

Ji we lava dikim ku cU van deman de hfin ji min veneqetin,  
horiya min. Ez pn bextiyar fi ji hertiştî kêfxweş im, kevoka  
160

min. Hfin guh nedin Fedorayê! Ez ê hemfi daxwazên we bi cî  
bînim. Ji bo xatirê ekselans be jî ez ê baş, giran îî bi pîvan tcv-  
gerim. Em ê dîsa ji hev re nameyên bextiyariyê binivîsîn:  
Em ê ramanên xwe û ku hebin em ê xemên xwe li hev par bi-  
kin. Em ê bi hev re jiyaneke bêdeng fi bextiyar bidomînm!  
Em ê mijfilî edebiyatê bibin, horiya min! Di jiyana min de gu-  
hertinek çêbfiye fi êdî hertişt ber bi başiyê dîçe. Tevgerên  
xwediya xaniyê min nerm bfine. Tereza baqUtir bûye fi tew  
Faldonî jî dev ji teraliya xwe berdaye êdî. Ez fi Ratazyayev U  
hev hatin. Ji kêfxweşiya xwe ez rabûm çûm ba wd. Bi rastî jî  
lawikekî baş e, dako. Ew hemfi tiştên ku U ser wî hatine gotin,  
gelacyên ehmeqane ne. Anuha baştir têgêhîştim ku ew hemû  
tiştên ha \dr ii derew bfine. Li ser me tişteki pêkenî ne nivisiye  
fi ne fikirîye jî. Wî bi xwe ji min re got. Berhema xwe ya nfi ji  
min re xwend. Ew navê «Lovelac» î ku wî ez pê navandim, ev  
ne bi mana çêr fi ne jî bi mana piçûkxistinê bûye. Wî şirove  
kir û got, ev peyvika ha ji zimanekî biyanî hatiye wergirtin fi  
tê m^ma «çavekirî». Di zimanê lîteratfirî de maneyeke xwe ya  
«heşaşî»yê hebûye, fi ewqas... Wekîdin tu maneyeke xwe ya  
giran tune. Tenê henekek sivik bûye, horiya min. Lê ji serhi-  
şkî fi naşîtiya xwe, min rabfi U dilê xwe girt. Ji ber vê yekê min  
ji Ratazyayev lava kir ku ew vê kêmasiya min bibore.



Îro dunya jî pir xweş e, Varenka min. Gerçî vê sibê berfe-  
ke hfir barî, lê xem nake. Bi kêmanî hêwa hinekî paqij bii. Ez  
derketim ku ji xwe re cotek potîn bikirim. Û min cotekî pir  
xweş kirî. Dfire ez derketim ser kuça Nevskiyê fi geriyam.  
Min kovara Pçolka(\*) û xwend. Hindik ma bû min ji we re  
katkirîaa tiştê herî girîng ji bîr bikira. Binêrin bê çi bfi!  
Vê sibê ez bi Emelyan îvanovîç fi Aksentî Mûcaylovîç re H  
ser ekselans ketim galegalê. Lê ma tu dizanî, Varenka, ev  
(\*) PçoUca: (Moza Bakur) Kovareke wê demê û edebîye. WW  
161

xêrxwazî û comerdiya wî ne tenê ji bo min bûye. Bi cUlpakî fi  
dUovaniya xwe navê wî U dunyayê belav bûye. Li her deverê  
navê wî tê gotin fi ji bo wd hêsnên sipasdariyê têne rijandin.  
Wek zarokeke xwe keçeke sêwî cU mala xwe de mezin kiriye û  
dûre bi karmendekî nas re daye zewucandin. Ekselans karên  
xwe yê arizî dayiye ber destê vî karmen(U. Ji bo lawê jine-  
biyeke xizan, di nivistanekê de karek peyda kiriye. Û wekîdin  
jî gelek çêjd kirine. Ez jî, çi ji destê min hat, min kir, dako.  
Ew çêyiya ku min ji ekselans cUt, her kî yê ku rastî min hat,  
min ji wan re kat kir. Bêyî ku tiştê veşêrim, şerm bikim...  
min hertişt kat kir. Ma ez ê rabim di rewşeke weha de şerm ii  
şerefa xwe bifikirim?

Na, min berziya çêyiyên ekselans bi  
dengekî wusa bUind got ku herkes bibihîse. Ne bi şermokî,  
tew bi berevajî viya, min bi serbiUncU, ji dilûcan û bi dilpekîn  
kat kir. Min tiştê ne hişt, hemfi kat kir. (Tenê min navê we  
ne hanî ser zimanê xwe fi çêU we ne kir, dayika min.) Min

xwediya  
xaniya  
xwe,  
Faldonî,  
Ratazyayev,  
potînên  
xwe  
fi

Markov... min hemii kat kir. Hinek dikiyan, ya rastî hemû  
keniyan. Diyar bfi ku rewşeke pêkenînê H min dbcuya, an jî bi  
potînên min keniyan. Ê ez ji sedî sed pê ewle me ku ew ji bo  
potînên min dikiyan. Ne gengaz e ku ew bi dilekî xirab ke-  
niya bin. Dibe ku ji naşîtiya xortaniyê, an jî ji ber ku ew dew-  
lemend bûn loma keniyan. An ne, ez ne bawer im ku tinazên  
xwe bi gotinên min kirin fi loma keniyan. Ê tew ne tiştekî ber  
bi aqilan e ku ew U ser kîsê ekselans keniya bin, ne wusa Va-  
renka?

Ez hîn jî ne hatime ser xwe, dayika min. Ev hemfi bûyerên  
ha ez ji hev xistim. Ma we ji xwe re êzing peyda kirin? Ser-  
mayê li xwe nejdin, Varenka! Di van hêwayên weha de bêyî  
ku meriv hay jê hebe sermayê cUgirin. Ax, dako, hfin bi van  
ramanên xwe yên xembar min dikujin. Ku we bizanî biiya bê  
ez ji bona we çiqasî banî Xwedê dikim! We gorên hirî û kin-  
162

cên germ hene, an ne? Li xwe binêrin, kevoka min! Ku we  
pêwîstiya tiştekî hebe, ji bona Xwedê vî pîremêrî neşUcînin fi  
rasterast ji min re bibêjin! Ew wextên teng fi tarî buhurîn êdî.

Ji bo min tew hustuxwar nebin. Jiyaneke xweş û ronî U pêş meye!

Çi demên xemgîn bûn, Varenka! Lê amUia ne xem e, buhurîn êdî. Piştî gelek salan meriv wan bi keservedan bi bîr tîne. Ez wan salên xortaniya xwe bi bîr tînim. Di wan deman de carina kopêkek jî di bêrîka min de peyda ne dibû. Birçî cUbfim, serma li min diket, lê dîsa jî kêfa min her U cî bfi. Sibehan dema ez di kuça Nevskiyê de cUgeriyam, ku çavên min bi ruyê keçeke xweşik biketa, wê rojê heta êvarê ez bextiyar bûm. Çi rojên xweş bfin ew, dako! Ji xwe jiyana bi xwe xweş e, Varenka. Bi taybetî jî H Petersbîrgê. Do, min bi hêsiyên çavan banî Xwedî kir ku gunehkariya heşasiyên wan rojên min bibexşîne: Xumarbaziya min, gaziaên min, ramanên min yê liberal fi serhişkiya min. Di lavakirinê de min ji cUlfican hfin hanîn bîra xwe. Tenê we bi şîretên xwe yê çê hêza jijdinê da min û riya jiyana U min vekir. Ez ê viya tew ji bîra nekim, dayika min. Ew kurtenameyên ku we ji min re şancU bfin, îro min yek bi yek hemfi maç kirin, horiya min. De bi xatirê we, dayika min! Li van nêzîkan li derekê paltoyekî firotinê hebfiye, ez xwe pê re bigêhînim. Bi xatirê we, horiya min, bi xatirê we!

Makar Devûşkîne we yê dilsoz

15ê Payîza Pêşîn

Makar Alekseyevîçê giranbuha!

DUpekiyeke mezin bi min girtiye. Binêrin bê çi bûye! H&e-

163

ke xirab U min rabfiye. Ka ez kat bikim, êdî hûn bi xwe bnya-

ra xwe bidin, dostê min î hêja. Mîrza Bukov H Petersbfigê bûye. Fedora rastî wî hatiye. Di duruşkê de bfiye, ber bi Fedorayê hêdfica hajotiye, jê pirsî ye û xwestiye ku bizani be ka li kuderê dimîne. Fedorayê pêşiyê ne xwestiye bibêje. Lê Bukov bi ken pê daye zanîn ku wî hay jê heye bê kî H ba wê cUmîne. (Xuyaye Anna Fedorovnayê hertişt jê re kat kiriye.) Li ser vê yekê Fedorayê xwe ne girtiye fi H wir, U rasta kuçê çî hatiye ber devê wê, jê re gotiye. Gotiye merivekî bêsiyaç e û ew bi xwe bfiye sedema vê mabdrabiya min. Wî jî weke bersiv tenê gotiye, ku perên merivan tune be, bextiyariya merivan jî nabe. Wê çaxê jî Fedorayê bi wd daye zanîn ku: ez ê bikani bim bi karê keda destê xwe debara jiyana xwe bikim, bikani bim bizewoicim û ku ev jî nebin, ez ê bikani bim H derve ji xwe re karekî peyda bikim. Dfire, di rewşa îroyîn de negengazbûna bextiyariya min, nexweşiya min U gotinên xwe zêde kiriye fi pê daye zanîn ku ez ê di nêzîk de bunirim jî. Piştî vê yekê Bukov jî daye zanîn ku ez hîn ciwan im, bi ber bayê naşîtiyê dikevim fi U gor gotina ji devê wî, ez hîn ne kemilî me.

Ez îî Fedorayê di wê baweriyê de bûn ku ew nizane bê em U kuderê dimînin. Lê do dema ez ji bo kirîna hin tiştan derketime fi çfime Gostînî Dvorê, ji nişka ve ew hatiye mala me. Ez bawer im ne xwestiye min U malê bibîne. Ji serfiber ve rewşa jiyana me ji Fedorayê pirsîye. Bi baldarî çavên xwe U hemfi tiştên hundurê malê gerancUye û piştî ku H karê min jî nêhirîye, pirsîye:

«- Karmendek heye, di ser we de tê fi diçe. Kî ye ew?»

A di wê gavê de hûn jî di hewşê re derbas biine. Fedorayê hûn pêşanî wd dane. Bukov H we mêze kirîye ii hûr hûr ke-

niyaye. Fedorayê jê lava kiriye ku ew bi gavekê zfitir ji malê biçe. Pê daye zanîn ku piştî ewqas naxoşyan ez hîn ne hatime ser xwe û ku ez wd li malê bibînim, ez ê nerihetir bibim. Pê-164

şiyê hinekî bêdeng maye, diire daye zanîn ku wî tenê xwestiye weha seredanekê bide me, diire jî xwestiye 25 rûbilan bide Fedorayê. Lê Fedorayê ne girtiye.

Ev tê çi manê? Çima Bukov hat mala me? Ji kuderê hînî van hemfi tiştên me bûye, ez têngêhîjim. Gelek gumanên têvel tene hişê min û ez pê dêşim. Fedora dibêje ku Aksînya gorima wê ya ku carina tê mala me, Nastasiya cilşo nas dike. Biraziyê Nastasiyayê jî di wê buroyê de odekar e. Ê di wê buroyê de hevalemî biraziyê Anna Fedorovnayê jî wek karmendekî kar dike. Ma nebe ku ev gelaciya bi vî awayî gih<sup>ti</sup> be Bukov? Lê dîsa jî cUbe ku Fedora çewt têngêhîşti be. Em nizanin bê em ê çi bikin. Lê ku ew dîsa were? Ji tirsan tew naxwazim bînim bîra xwe jî. Do êvarê jî dema Fedorayê ev hemfi tiştên ha kat fikir, tirsek wusa li min rabii ku hindik ma bii ez bixewiriyama. Ev merivên ha çi ji me dbcwazin? Ez naxwazim bi wan bizani bim. Ji keçeke nola min reben çi dbcwazin? Ax, ez wusa ditirsim ku! Dibêjim qeyê ew Bukova ê anuha ii anuha têkeve hundur. Ez ê çi bikim wê çaxê? Sernivisa min hîn ji bo min çi U dar dixê? Ji bona Xwedê werin serlêdana min, Makar Alekseyevîç. Werin, ji bona Xwedê werin!

V.D

18ê Payîza Pêşîn

Dayika min, Varvara Alekseyevna!

îro di xaniyê me de bfiyereke wusa dilşewat fi wusa nepayî qewumî ku nayê bilêvkinê. Gorşkovê me î reben (divê ez bidun zanîn ku, dako.) rasterast ji dozê pak bûye. Biryara dadgehê ji zû de hati bfi dayîn, lê ew bi xwe îro çû dadgehê ku beşdarî buyara dawdn bibe. Doz U hêla wd ketiye fi bi bextiya-165

riya wd qediyaye. Ji sersarî fi neparastina malê dewletê, doza tawanbariyê li wd hati bfi vekbin. Ji hemfija pak filitî. Dadgehê bazirganê fêlbaz tawanbar derxistiye ku wek doza şerefê pereyekî pir bide Gorşkov. Bi gotineke dm, mêrik şerefa xwe jî pak derxist fi rewşa xwe jî xweş kn. Bi kurtî dawiya hertiştî li gor daxwaza dilê wî bû.

Iro dema saet di sisiyan de hat malê, gwîn lê sipîçoUd, bfi bû weke riîbendekê. Lêvên wd dUerizîn, lê cUpişu-î. Jina xwe fi zarokên xwe hemêz kir. Ji bo pîrozkirinê em hemfi bi hev re çiin ba wî. Ji vê tevgera me pir diltenikî bfi, xwe U vî aliyî fi wî aliyî xwar kir, û yek bi yek çend caran destê me hemfiyan şidand. Bi min wusa hct ku bejna wî dirêj fi mUên wd rast bfi bfin. U tew kelagiriya wî ya hertimî jî di çavên wd de ne ma bû. Çiqas dilpekîn bû bfi, rebeno! NUcanî bfi gavekê di ciyê xwc de rawestiya, çi bi ber destê wd dUcet radUiiştê fi bi şûn de dadihanî, her dipişirî, xwe xwar dUdr, rfidinişt, radibii fi dîsa rfidinişt. Xwedê dizane wî hay jî ji xwe tune bfi ku çi digot. Dikire pilepil ii digot: «Şeref ii namûsa min... navê min î pak... zarokên min...» iCelagirî li qirUcê piçikî û girîya jî. Ji me jî, hêsir bi çavên me gelean ket. Ratazyayev, bêguman xwest ku dilê wd xurt bike:

«- Yekî ku nanê zii;ê wd tune be, şeref û namfisê çi dike?  
Serê hertiştî pere ye, tavikê min, pere! Ji bo wan perê ku bi  
dcst we ketiye, sipasd. riya xwe bikin!» got û pê re bi destê  
xwe milê Gorşkov tepa id.

Bi min wusa hat ki

ev tevgera wî bi Gorşkov naxoş hat.

Naxoşiya vê tevgerê rat erast li xwe ne da der, lê bi awakî bê-  
mane li Ratazyaycv mê e kir fi destê wdji ser mUê xwe da aU.

U berê bûya, ne genga

bfi ku tişteki weha bUcira, dako. Her

meriv xwiyekî xwe î sey heye, em çi bUdn. Serqisê di rewşeke  
weha kêfxweşîn de mi;

ê nikanî bfiya kubarî U xwe daniya.

Meriv carina zêdetirî p vanê nefspiçûk û giramgîr dibe û ev jî

166

dostanî û dilpakiya meriv dide xuyakirin. Lê U vir pirs ne ez  
im...

Gorşkov:

«- Belê, hebfinan peran jî baş e! şikir ji Xwedê re, şikir ji  
Xwedê re...» got ii heta ku em U wir bûn jî, wî her dubare kir  
û got: «şikir ji Xwedê re!»

Jina wî xwarineke ji carên hercarîn xweştir û dewlemend-  
tir da ber me. Xwediya xaniyê me bi xwe çêkirina xwarinê  
girti bfi ser xwe. Ya rastî, xwediya xaniyê me jineke baş e. He-  
ta şîvê Gorşkov di ciyê xwe de ne hewiya. Kesên ku banî kiri  
be an ne kir be, ew ket odayên hemfi kirêdaran û derket. Bi  
awakî bêhay dikete hundur, dipişirî, li ser sandaliyekê rûdi-

nişt, du gotinên xwe fikir an ne fikir, dûre radibû riya xwe digirt ii diçii. Di oda efserê deryayî de bi qeremaçan dilîstin. Wek lîstikvanekî çaremîn ew jî li ber masa lîstikê dan rûnişkandin. Lîst, lê ji ber tewşomewşiya xwe piştî çend destan qeremaç danîn, ji ber masê rabii ii bi pUepU:

«- Na, armanca min ne ew bfi ku... na.» got fi ji wir derket. Li korîdorê em rastî hev hatin. Bi herdu destên min girt ii bi awakî seyr li nava çavên min nêhirî. Destên min guvişand ii bi awakî efsiinî ji min vekîşiya. Pişirîneke seyr fi giran her U ser lêvên wî bfi. Jina wî ji kêfxweşiyê digirîya. Rasterast mîna ku di mala wan de şên û şahiya cejnekê hebe. Me zîî xwarin xwar û em rabfin.

Piştîşîvê Gorşkovji jina xwe re gotiye:

«- Va ez ê biçim xwe dirêj bikim fi hinekî bêhna xwe berdîm, delala min.»

Û bi rastî jî çfiye xwe dirêj kiriye, banî keça xwe kniye, destê xwe daye ser serê wê îî diîrfidirêj destê xwe U porê wê pelancUye. Dfire vegeriyaye ser jina xwe û gotiye:

«- Ka Petenka?... Ka Petenkayê me H kuderê ye?»

Jina wd bi gunehweşîn bersiva wî daye ii gotiye: ma ne ew  
167

miriye. Herweha Gorşkov di ber xwe de kiriye pUepU û gotiye:

«- Belê, belê, ez dizanim. Anuha Petenka U ruyê asunanan e.»

Jina wî nêhirîye ku kêfxweşiyê U serê wd xistiye û hişê wî ne li serê wî ye. Loma jê re gotiye hinekî rakeve.



Wîjîgotiye:

«- Baş e, ez parîkî çavên xwe bidim hev.»

Herweha

xwe

zivirandiye

ser

kêlekê

û

hmekî bêdeng

maye. Diîre dîsa xwe bi paş ve livancUye û xwestiye tişteki bi-  
bêje. Jina wî têngêhîştiye fi pirsîye ka ew çî divê. Lê bersiv  
ne girtiye. Piştî ku xwe hinekî ragirtiye, gotiye qeyê ketiye xew  
î ew jî rabîye, bi qasî gavekî ji xwe re çîye mala xwedîya xê-  
nî.

Piştî saetekê vegeriya û mêze kirîye ku mêrê wê her we-  
ke xwe î berê raketiye. De bUa ji xwe re rakeve, gotiye fi xwe  
daye ber karekî xwe. Li gor gotma wê, heta nîv saetekê jî ew-  
qas bi kar fi ramanên xwe daketiye ku mêrê xwe jî ji bîra ki-  
riye. Dûre ji nişka ve bi nerihetiyeke seyr bi ser xwe ve hatiye.  
Bêdengiya ku bi awakî mhî girtiye ser odê, tseke kambax U  
wê rakiriye. Dema li nivînên mêrê xwe mêze kirîye, dîtiye ku  
mêrê wê her dîsa weke xwe î berê di xew de ye. Ber bi wd  
çûye, lihêf ji ser rakiriye fi nêhirîye ku giyanê Gorşkov cemi-  
diye.

Belê Gorşkov mir, dako, mir. Mîna ku birfiskê lêxisti be, ji  
nişka ve mir. Lê êdî Xwedê dizane bê ew ji ber çî mir. Vê ye-  
kê bandoreke wosa li min kir ku hîn jî ez bi ser xwe ve ne ha-  
time, Varenka. Min tew bawer ne dikir ku merivek wusa ji

nişka ve fi bêdeng bimire. Ax, ev Gorşkovê reben! Çi sernivi-  
seke xemgîn e ev! Jina wd hêsiran dibarîne fi perîşan bfiye.  
Keça wî xwe vekişandiye quncUcekî! Oda wan tevlihev e. Û  
doktokek ê were lêkolîneriya mirî bUce. Pir dUêşîn e, gelekî  
168

heyf e bi rastî. Tiştê herî xemgîa, wext fi roja mirmê ne diyar  
e, ji nişka ve bê hayfibay bi ser merivan de tê.

Makar Devûşkîne

we.

19ê Payîza Pêşîn

Hevala giranbuha, Varvara Alekseyevna!

Ez lez dikim ku mizgîaiyekê bigêhînim we. Ratazyayev ji  
min re U ba nivismendekî karek peyda kiriye. Nasekî wd ha-  
tiye, bi xwe re tomareke destiuvis haniye fi daye ba wd. Karekî  
pir e, şUcu- ji Xwedê re! Lê destniviseke ku bi rihetî bête  
xwendin nine. Loma mzanim bê ez ê çawa dest pê bikim. Û  
dbcwazin paknivisa wê jî zû bête kiria. Ji bUî viya jî bi navaro-  
kek wusa ye ku meriv têngagêhîje. Li gor peymanê me, ew ê  
serî rfipelekî çel kopêkî bidine min. Bi katkirma viya, dbcwa-  
zim bi we bidime zanîn ku ew ê pereyekî zêde jî têkeve destê  
min. De anuha bi xatu-ê we dako. Anuha ez ê U ber karê xwe  
rûnim.

Makar Devûkîne

23ê Pajîza Pêşîn

Dostê hêja, Makar Alekseyevîç!

Ev sê roj bfin ku min nikanî bfi ji we re biiuvisanda, dostê  
min. Ez gelekî xemgîn û bêhteng bûm. Pêr, Mîrza Bukov U

ba me bfi. Fedora derketi bû der fi ez bi tena serê xwe U malê bfim. Dema min derî vekir fi ew U pêş xwe (Ut, wusa tirsiyam 169

ku di ciyê xwe de sipiisar bûm. Min hîs kir ku gwdn H min zer bii. Weke hertim bi kenê xwe î bilind derbasî hundur bii, sandaliyek kişand fi U ser rûnişt. Heta demekê jî ez ne hatun ser xwe. Di dawiya dawdn de ez vekişiyam quncikekî ii min dest bi karê xwe kir. Wî taviê dev ji kenê xwe berda. Diyar bû ku tevgera min ew matmajd ku". Di van rojên dawdn de ez jar ketim, çavên min di kort de çiin, gupên min ketin hev fi gwînê min vemirî. Bi rastî jî yekî ku beriya salekê ez dîti bim, ew ê anuha bi dijwarî min nas bike. Piştî ku Bukov bi çavekî lêkolînerane fi dûrfidirêj U min mêze kir, dîsa kêficweş bû. Tiştina got, lê nayê bîra min bê min çi bersiv dayê. Û dîsa dest bi kenê xwe kir. Rasterast saetekê H ba min rfinişt, gelekî peyivî, ji vir fi wir pir tiştina pirsî. Di çûyîna xwe de bi destê min girt û got -tiştên ku wî ji min re gotin, ez peyvik bi peyvik dinivisînim-:

«- Varvara Alekseyevna! Bila di navîna me de be, ev meriva we, fi dosteke min ya hêja Anna Fedorovna jineke rezfl fi riswa ye!... (Li vir ji bo wê peyvikek gelek xirab jî bi kar hanî.) Ya ku dotmama we ji rê derxist îî ya ku hfin jî xistin rewşeke xirab, ew bii. Ez bi xwe jî di rezîHyê geriyam. Lê jiyana woisa ye, em çi bikin.»

Piştî van gotinên xwe heta ku jê hat bi dengê bilind keniya. Dfire da zanîn ku ew bi kêrî zarxweşiyê nayê, lê wek yekî malmezin wî ew tiştên pêwîst îî girîng gotiye ii ew ê li ser

wan tiştên mayî jî bi kurtî deng bike. Daxwaza zewacê U min kir û bi min da zanîn ku ji bo ez şerefa xwe xelas bikim, çi ji destê wî were, ew ê bike ii ew viya jî weke vatiniya xwe dizane. Dewlemendbfina xwe jî bi lêv kir fi got ew ê piştî dawetê min bi xwe re bibe gundê xwe î U navçeyê Stepê, ew ê li wir ji xwe re biçe nêçira keroşkan û cereke din jî venegere Petersbûrgê. Lewra U gor wî, Petersbiirg ciyekî dUverişîn bûye. Li Petersbûrgê biraziyekî wî yê tolaz hebûye, sond xwariye ku

170

ew ê wd ji mîrasa xwe bêpar bûye. Sedema ku ew dbcwaze bi min re bizewice jî ev bfiye ku bi riyeke rêdarî ji xwe re xwe-diyeke mîrasê çêbike. Dûre da zanîn ku ez di ciyekî gelekî xizan de dimînim, di koxikeke weha de nexweşketina min ne diirî aqilan e, ku ez bi qasî meheke din jî di vir de bimînim ez ê bimirim. Paşîngê jî U gotinên xwe zêde kir ku xaniyên U Petersbûrgê xirab in û di dawiya dawdn de jî ji min pirsî ka daxwaza min ii tiştê heye an ne.

Vê pêşniyara wd ez wusa veniciqandim ku, nizanim bê çawa, lê min ji nişka ve bir ii berda girî. Bukov ev giriyê min wek hêsirên sipasdariyê şirove kir fi got; hertûn serwextiya wd hebûye ku ez keçeke dilpak, dUtenik ii xwenda me, lê dîsa jî piştî ku ew baş ser fi binê jiyana min ya îrojdn têgêhîştîye, vn ev biryara xwe daye. Li vir çêU we jî kir ku wd hay ji hertiştî hebûye. Wî hay jê hebûye ku hfin merivekî cUlpak in. Wî (U tune bûye ku di binê çêyîya we de bimîne. Ê dûre phs kir, ka ji bo wan hemî çêyîyên ku we U min kirine, ku ew pêncsed rîbUî bide we, têrî we dike an ne. Dema min pê da zanîn ku

ew çêyiyên ku we ji bo min kirine, bi peran nayên dayîn; wd jî H min vegcrand û got, ev yên ha peyvên vikûvala ne, tiştên weha di romanên de hatine nivisîn; salên min hîna ciwan biiye, di serê min de bayê ramanên seyr î helbestane hebfiye. Li gor wd roman tiştên wusa bfine ku keçên xort ji rê derdixin fi hew. Ji ber vê yekê jî dilê wd ji pbtîkan mabûye. Ji bo ku ez baş merivan têbigêhîjim, diviya bûye salên min bi qasî yên wd be ku ez wê çaxê bikani bim çê fi xirabiyê ji hev derxînim. Piştî van şîretên xwe, li gotinên xwe zêde kir ku ez vê pêşniyara wd baş bipîvim; di gaveke weha girîng de ku ez bêjd U ser bifikirim ii biryara xwe bi(Um, ew ê ji bo min heyf be; kêmaqilî û naştî malikê U ciwanên nedîtî dişewutîne. Ji min re (Ugot, ew bersiveke hêvîdar ji min dipê fi ku ez vê pêşniyara vn nepejirînim, ew ê biçê li Moskvayê ji neçarî bi keça bazirganekî re

171

bizewoic. Lewra sondeke mezin xwariye ku ew biraziyê xwe ji mîrasê bêpar bihêle. Pênc sed rîbU danî ser gergefa min ku li gor gotina wî, sv/ perên ^ekir bûne. Di derketina xwe de bi min da zanîn ku ez ê H gund weke nanê pofikî qelew bibim, destekî min ê di şîr de fi yê (Un ê di hunguv de be; anuha gelek karên wî hebiiye, ji sibê de bfiye ku ew ji bo karfibarên xwe bi vir û wir de beziyaye, û di vê navberê de fesalek dîtîye û hatiye serlêdana min. Ê rabfi çû.

Ez dfirfidirêj H ser ramiyam fi min gelekî serê xwe di ber de êşand, lê di dawiya dawîn de min biryara xwe da, dostê min. Ez ê bi Mîrza Bukov re bizewoicim. Vê pêşniyara wî divê ez bipejirînim, dostê min. Yekî ku bikani be min ji vê navno-

tiyê xelas bUce fi şerefa min bi şiin de bide; yekî ku bUcani be di rojên pêş de bi destê min bigire ii min ji xizanî, tengasî û malkambaxiyan bipolarêze, ew jî ew e. De ka wekîdin ez ê çi ji pêşerojê bipê? Ka ez ê hîn çi hêviyê ji sernivisa xwe bikim? Fedora dibêje, bextiyariya ku tê ber lingên meriv, divê meriv pîn neke. Em viya jî weke bextiyariyê bi lêv dikin êdî! Ez bi xwe wekîdin jî tu riyeye din nabînim, dostê min î giranbuha. Ka ez ê bikani bim çi bikim? Bi karê destan, min saxî cU xwe de ne hiştiye û hertim jî ez nikanim kar bUcim. Ku ez U ba merivên biyanî kar bikim, ez ê tetnaxanî bibim fi bimirim. Ez bi kêrî karê xelkê jî nayê. Lewra di çêbiina min de nexweşî bi nûn re heye ii ez ê ji wan re bibim bar. Bêguman ew ciyê ku ez ê biçime wir jî ne buhuşt e, lê tu riyeye din li pêş min tuneye.

Bêjd ku bi we bişêwirim min xwest ez birayara xwe bidim. Ev birayara ku we xwend, nayê guhertm. Ez ê bi Bukov bigêhînim ku ez pêşniyara wî dipejirînim. Ji xwe bê tewatî her di ser min de digot î digot ku ez zfi bersivekê bigêhînim wd. Goti bfi ku ji bona karûbarên xwe divê ew zfi ji vir biçe fi ji bo sedemên wusa piçfik ew ê nikan be ji rêwîtiya karê xwe bimîne.

172

Xwedê dizane bê ez ê bextiyar bibim an ne! Lê min sitara sernivisa xwe sipartiye cUlovanî ii kanebûna wî ya pîrozwer. Li gor ku dibêjin, Bukov merivekê baş e. Dibe ku riimeta min bizani be fi ez jî ya wî. Ma wekîdin jî meriv ê çi ji zewaca me bipê?

Min ji we re hertişt bi lêv kir, Makar Alekseyevîç. Ez baş

dizanim ku hfin ê xemgîniya min têbigêhîjin. Nekin ku hfin min ji biryara min bikin. Lewra kirinên we ê U avarê biçe. Wan hemfi tiştên ku mm neçarî vê tevgerê cUke, di mêzîna dilê xwe de baş li pîvanê bbdn. Pêşiyê nerihetiyekê bi min girt, lê anuha ez rihet im. Dûre ew ê çi bibe, ez jî nizanim. Tiştê ku ew ê bibe, ji xwe ê bibe. Hertîşt bi ya Xwedê dibe. Va ye Bukov hat. Divê ez nama xwe nîvçe bihêlim. Min ê ji we re hîn pir tiştên din bigota, lê va Bukov hat jî!...

V.D

23ê Payiza Pêşîn

Dayika min, Varvara Alekseyevna!

Ez lez bi lez bersiva nama we dinivisînim. Lez dikim bi we bidime zanîn ku tevliheviyeke seyr girtiye ser min. Bi rastî jî seyr e... Do me Gorşkov kire gornê. Belê, rast e, Varenka, Bukov gelekî efendî tevgeriyaye. Lê ez têngêhîjim ku hfin çawa bi vê yekê razî bfin, berxika min? Rast e, hertîşt bi ya Xwedê dibe. Wusa ye û divê wusa jî be. Fedora jî bi we re ye. Bêguman hûn ê êdî bextiyar bm, dayika min. Hfin ê di çitibcêrê de bijîn, kevoka min, berxika min, horiya min!... Lê ez têngêhîjim, Varenka, ev çawa wusa zfi bfi. Erê, karûbarên... Rast e, gelek karfibarên Mîrza Bukov heye, ma karûbarên kê tuneye ku! Bêguman wek herkesî karûbarên wî ê jî hebe. De-173

ma ji ba we derdiket îî cUçû, min ew dît. Xweşmêrekî balkêşîn fi gelekî jî balkêşîn e. Lê pirs ne pbsa baUcêşbfijdna wd ye. Ewk e, ez ê bi xwe êdî ne ez bim. Ê em ê çawa bikani bin ji hev re nameyan binivisînin? Bi tena serê xwe ez ê çi bUcim,

horiya min? Wek ku we di nama xwe de gotiye, min jî hemfi tişt di mêzîna dilê xwe de li pîvanê xist fi ez hiir hûr li ser sedemên wan sekinîm, dayika min. Dema ku min ji karê ber xwe, paknivisa rûpela bîstan qedand, ji nişka ve ev ramanên ha li min çêbiin. Mafir ku cUvê hfin biçin, wê çaxê divê gelek pêwdstiyên we jî hebin ku hiîn bUcirin. Ji bona we solina, kincina pêwîst in. Ez ji we re bibêjim, di kuça Grohovayayê de ez dikaneke baş nas dikim. Di nameyeke xwe de min ji we re çêlî wê kiri bfi, nizanim tê bîra we an ne? Çawa nayê bîra we, dako? Lê hfin nikanin anuha biçine wdr. Na, nabe, ne gengaz e! Ji bo we gelek tiştên kirînê divêt û ji ber vê yekê jî divê hfin duruşkeyekê kirê bikin. Ê ya din, anuha dunya jî ne xweş e. Ca bi xwe li derve binêrin bê çi baraneke xurt dibare. şiu fi şepelî ye, hfin ê sermayê li xwe bbdn, horiya min. Ruhuka min, hfin ê bi zekemê bikevin! Hfin ya ku ji merivên nenas ditirsin, çawa dibe ku hfin dikevin rê fi bi vî meri\ d re diçin? Ê ku hfin biçin, ez ê çawa bi tena serê xwe bimînim? Belê, li gortina Fedorayê bextiyariyeke mezin U bendî we ye. Lê ev jî nika rasterast dîn c. Dbcwaze pê min tetirxanî bike. Ma hfin ê êvarê neçine dêrê, dayika min? Ji bona diyîna we, ez ê jî bihatama wir. Bêguman hfin keçeke dUpak, dUtenik fi xwenda ne, lê dîsa jî çêtir e ku ev merivê ha biçe bi keça bazirgan re bizewuce! Ka hfin çi dibêjin, dayika min? BUa biçe ji xwe re bi keça bazirgan re bizewoicc! Dema ku tarî dakeve, ez ê bi qasîgavekê werime ba we, Varenka min. Ji xwe di van deman de tarî zii dadikeve erdê. Çer ku tarî dest pê bUce, ez ê xwe bavêjime ba we. Ji sedî sed ez ê îro werim û saetekê U ba we bimînim, dayika min. Ji xwe anuha hûn U bendî Bukov in, lê



gava ku ew biçe... wê çaxê hûn bipên, ez ê werim, dayika min...

Makar Devûşkîn

27ê Payiza Pêşin

Dostê min î hêja, Makar Aleksejevîç!

Mîrza Bukov dibêje ku ji sedî sed divê ez ji xwe re ji qumaşê holandî sê duzîne keten peyda bikim. Ji ber vê yekê jî bo dirûtina du duzîne kinc, heta ku ji destê me tê divê em zû terziyan bibînin. Lê wext U me dereng e. Mîrza Bukov hêrs dibe fi dibêje, em pir li ser van paçfipolan disekin. Piştî pênc rojên din em ê bizewucin fi dotira wê rojê jî em ê têkevin rê.

Mîrza Bukov pele dike ii dibêje, em li avarê wextê U vir dibu-hurînin. Ji hertiştî ewqas westiyame ku nikanim li ser lingên xwe bisekinim. Hîna gelek karên din jî hene ku divê bête kirin. Xwezika tew em neketana nav. Dantêlê(\*) hevrişim ii yê din kê in, divê ew jî werine kirin. Lewra Mîrza Bukov dibêje ku ew naxwaze jina wî bi kincên weke kincên destirmanan ve bigere, dbcwaze dema em biçine wir jî, divê ez ji hemii jinên xwediyên erd ii wargehan çêtir bême xuyakirin. Ji kere-ma xwe, Makar Aleksejevîç, ji ber vê yekê xwe bigêhînin kuça Grohovayayê ba Madam Chiffonê fi jê bipirse ka bê ew nikane ji bo me terziyan peyda bike, ev yek; ya duduyan, jê bipirse ka bê ew bi xwc jî heta vir kerem nake. Ez îro nexweş im. Mala me ya nû pir sar û pir jî tevlihev e. Xaltiya Mîrza Bukov wusa pîr biiye ku êdî nikanî bfiye bêhna xwe jî bigirê.

(\*) Dantêla: Jifransî tê. Bi her babetên ta û dezî nexşên veçi-

nandîye. WW

175

Tirsa min ew e ku beriya em biçin, ew bimire. Lê Mîrza Bukov dibêje, xem nake, ew ê were ser xwe. Mala me berdîberdan e. Ji ber ku Mîrza Bukov U ba me namîne, xulamên wd jî her yek bi derekê de pengizîye ii wenda bûne. Carina hemfi karfibar li ser Fedorayê dimîne û ew bi tena serê xwe dUce. Ev sê roj in ku destirmanê oda Bukov jî wenda ye fi Xwedê dizane bê U kuderê ye, qaşo serfisiya wî li ser hemû karfibarên malê ye. Mîrza Bukov her sibe bi duruşkê tê, hertûn jî vê rewşê dibîne ii bêhtengî dibe. Tew do H kfbcayê xwe jî xistiye fi ji ber vê yekê ew fi polîs ketine pêşîra hev. Li vir kesê ku ez vê namê pê bişînim tune ye, loma ez bi postê dişînim. Hindik ma bii min tiştê herî girîng ji bîr bikira! Madam Chifonê sUav bikin ii bibêjin, bUa dantêlan U gor wê nimiina ku min do dabfiyê, çêbike. Ji bo ku modelên nfi pêşan bide, jê re bibêje bila ji sedî sed ew bi xwe jî heta ba mm were. Wekîdin jî pê bidine zanîn ku min ramana xwe ya U ser qeytan jî guherandiye fi divê bi nîkê bête veçinandin. Ê tiştêkî din jî! Pîtên marqên destmalan divê di gergefê de bête veçinandin, gergef! Ji bîr nekin! Ne bi smgê destan, di gergefê de! Pir ne ma bfi ku min ji bîr bikira, tiştêkî din jî. Ji bona Xwedê jê re bibêjin bila pelên li ser hustukura pelerîn, perçivandî bête nexîşandin;

gilîçek

ii

dirikên

wî jî

bi

kordoneyê(\*)

were

hiinandin. Bila li dora hustukurê jî, dantêl an jî farbalaye-  
ke(\*\*) biber bête dirfitin. Ji bîr nekm, yek bi yek van hemfiy-  
an ji Madam Chiffonê re bibêjin, Makar Alekseyevîç!

V.Dya we.

(\*) Kordone: Ji fransî tê. Bi hûnandina çend tayên zirîç an jî  
hevrişîm pêk tê û ji bo nexşên destan bi kar tê. WW

(\*\*) Farbala: Jifransî tê. Nexşên ku li qeraxênperde an jîkin-  
can têne veçinandin. WW

176

NOT: Ji bo ku ez van suxrên xwe cUdim ber we ii her ez we  
pê dêşînim, ez şerm dikim. Ev sê roj in ku her hfin ji bo min  
dibezin. Çi bikim, mala me tevUhev e ii ez bi xwe jî nesax im.  
Ji ber vê yekê dilê xwe ji min nehêlin, Makar Alekseyevîç. Ez  
xwe gelekî xembar hîs dUcim! Ax, ew ê çî bibe, dostê min,  
Makar Alekseyevîçê min î dUovan? Ez tew newêrim U ser ro-  
jên pêş jî bifikirim. Bayekî tirsê bi min girtiye û mîna ku ez  
pfiç bfime.

NOT: Ji bona Xwedê, dostê min, ji van tiştên ku min anu-  
ha gotin, tew tişteki jî ji bîra nekin! Tirsa min ew e ku hûn  
çewtiyekê bikin. Ji bîr nekin, cU gerfgefê de, ne bi singê de-  
stan!

V.D

27ê Payîza Pêşin

Sitiya giramîdar, Varvara Alekseyevna!

Siparişên ku we goti bûn, min hemfi jî bi baldariyeke mezin bi cî hanîn. Madam Chiffonê da zanîn ku ji xwe ew bi xwe jî fikiriye ku di gergefê de veçine, wusa çêtir e, got. Lê ez têngêhi<sup>^</sup>tim bê çima. We di nama xwe de U ser farbalayan tiştina goti bûn, wê jî çêlî farbalayan kir, lê mbcabin, dako, min ji bîr kir bê wê çî got. Tenê tê bîra min ku ew pir peyî\ a fi rasterast jineke zimandirêj e. Tu tiştê ku kat ne kir, ne ma! Ji xwe ew ê bi xwe jî were û ji we re kat bike. Ez gêj û dewi) d bûm, dako, fi îro ne çîm buroyê jî. Lê hûn xwe U avarê xembar dikin, dosta min. Ji bo rihetiya we; ez dikanim U tevayiyê cUkanan jî bigerim. Hûn dinivîsînînin û dibêjin ku hûn (Utirsin U ser rojên pêş jî bifUdrin. Lê îro saet H heftan hûn ê bi hertiştî

177

bizani bin. Madam Chiffon ê bi xwe were mala we. Ji ber vê yekê qet hêviya xwe neşikînin û bUa dilê we pêt be. Bi ya Xwedê, hertişt ê ber bi başiyê biçê! Ax, ev farbalaya bêyom! Hiş î aqilê min her H ser wê ye. Ez ê bUiatama, ji sedî sed ez ê bihatma mala we, horiya min, tew ez du caran heta ber deriyê hewşa we jî hatim. Lê ew Bukova, ango min xwest ez bibêjim, Mîrza Bukov... her bi hêrs e û herweha nabe, ez ê nikani bim. Ne wusa?

Makar Devûşkîn

28ê Payîza Pêşin

Makar Alekseyevîçê giramîdar!

Ji bona Xwedê zfi xwe bigêhînin ba zêrker! Jê re bibêjin, ne pêwîst e ku ew guharên bi kevirê mirarî fi zimrfit çêbike!

Mîrza Bukov dibêje, pû" pere lê (Uçe û ew ê ji binê dernekeve. Hêrs dibe û dibêje, wî gelek pere lê mesref kiriye fi em dikin ku wd bişêlînin. Ê dide zanîn ku wî do bizanê bûya ew ê ewqas mesref bibfiya, wî ê xwe neda ber vê yekê. Dibêje, çer ku mara me bête birîn, em ê biçin. Dibêje, em ê banê kesê nekin fi diviya bfiye ez jî hêviya xwe ji dans û lotikan bibirim. Heta cejnê hîn pir wext hebfiye! Wusa (Ubêje. Lê ew Xwedê bi xwe jî dizane ku tew çavên min U van tiştên ha nîne. Siparişa van hemii tiştan Mîrza Bukov bi xwe kiri bû. Ewqas bi hêrs e ku tew newêrim bersiva wî jî bidim. Kî cUzane bê hîn çi were serê min!

V.D.

178

28ê Payiza Pêşin

Kevoka mui, Varvara Alekseyevna!

Min... ewk... ango zêrker got, baş e. Lê min xwest ez pêşiyê çêlî xwe bUcim fi bibêjim ku ez nexweş ketune û nikanûn ji nav nivînan rabim. Ê di vê gavê de, gava ku ewqas pir karê min hebe, pêwîstî ji mm hebe, ez bi zekemê ketim. Serê xwe bixwe! Ê mîna ku ev hemfi soshmetên ha têr ne kirin, (U ser de ekselans jî di van rojên dawîn de gelekî tfij bûye. Gelekî U Emelyan îvaovîç hêrs bû û xwe rakişandê. Di dawiya dawîn de ew bi xwe jî ji hêle de ketin. Wek ku hûn dibînm, ez, we ji hertiştî haydar dikim. Min dbcwest ez hîn pntu- ji we re bmivîsînim, lê tirsî min ew e ku ez ê we nerihet bUdm. Ez merivekî kêmaqU û sade me, dako, çi tê hişê min ez (Univîsînim. Dibe ku hfin... ewk... lê dev jê berdin.

Makar Devûşkîne

we

29ê Payîza Pêşin

Bendka min, Varvara Alekseyevna!

Min îro Fedora dît, horiya min. Digot, hfin ê sibe bizewucin, dusibe têkevin rê û tew Mîrza Bukov duruşke jî kirê kiriye. Rewşa ekselans min berê ji we re nivisan(U bû, dako. U tiştêkî din jî: Mm fatûra dUcana kuça Grohovayayê kontrol kir. Hemfi jî rast e, lê gelekî buhaye. Lê ez têngêhîjLm bê çima Mîrza Bukov U we hêrs dibe. Bextiyarî para we be! Ez kêfxweş im fi ez ê gelekî kêfxweş bfiyama ku hûn bextiyar bifiyana. Ji bo seremoniya mara we, ez ê bUiatama dêrê. Lê ne gengaz e, dako, piştta mm dêşe û bi min re nayê. NerUietiya  
179

mm nameyên me ne: Ji vir û weha kî ê ji me re nameyên me bigêhîne me, dako? We çêyieke gelekî baş li Fedorayê kiriye, dako. We karekî baş kiriye, dosta min, karekî pir baş! Ji bo vê çêyia we, Xwedê ê U ruyê we mêze bike. Tu çêyiek bê beramberî namîne! DUovanî, bi rastiya asimanî tê nirxandin fi ew ê zfi an dereng para xwe ji rihma Xwedê bigire.

Dayika min! Min dixwest ku ez ji we re pir û pir, her deqe, her saet û hertim binivisînim. Pirtiikek we li ba min maye. Çîrokên Biyelkîn. Ji bona Xwedê wê ji min negirên, dako, wê diyariyê min bikin, horiya min. Ne ji bo ku ez ê wê dîsa bbcwînim. Lê hiin bi xwe jî dizanin, dako: Zivistan ê di ser me de were, şev ê dirêj bibin fi xemgînî ê dakeve ser min. Wê çaxê divê ez bixwdnim û pê xemgîniyê H xwe belav bikim. Ez ê ji vir

koçî mala we ya kevn bikim, ez ê wê ji Fedorayê kirê bikim.  
Ez ê êdî ji vê jinika dUpak ciyê nebim. Jineke jîr e. Do, ez di  
mala we ya valabûjd de geriyam fi min bala xwe da derfidora  
xwe. Gergefa we, wek xwe î berê tev karekî destpêkirî li qun-  
cikekî hati bii hiştin. Min H hiinandina karê we nêhirî fi min  
dît ku çend wesle fi quslik U wir ma bfin. Li kaxezeke nama  
min, we dest pê kiriye dezî lê gerandiye. Di çavika masa we  
de min pelek kaxez dît ku li ser tenê hevokek weha: «Makar  
Aleksyevîçê giramîdar, ez bi lez...» nivisandî bfi fi hew. Baş  
xuya bfi ku di gava nivisandina wê de yekî hfin nerihet kirine  
ii we jî ew wusa hiştiye. Textikê we î raketinê hîn U paş nav-  
birkê li quncikekî ye. Ax, kevoka min!

De bi xatirê we! Ji bona Xwedê, zû bi çend rêzUcan bersiva  
vê nama min bicUn!

Makar Devûşkîn

180

30ê Payîza Pêşîn

Dostê nun î hêja, Makar Aleksyevîç

nt

Hertişt bfi û çfi! Êdî ez fi sernivisa xwe me. Ez nizanim bê  
ev sernivisa ê çawa be, lê ez hustuyê xwe li ber daxwaza Xwe-  
dê xwar dUcim. Em sibe diçin. Ev cara dawîn e ku ez xatir ji  
we dbcwazim, dostê min î giranbuha ii dUovan, taca serê min!  
Ji bo mm xemgîn nebin, bextiyar bijîn, carina min bi bîr bînin  
fi sitara Xwedê U ser we be! Ez ê pir we bi bîr bînim û ji bona  
we banî Xwedê bikim.

Herweha ev dewra jî buhurî. Anuha wexta ez ber bi jiyana

xwe ya nii diçim, ji demên xwe yên buhurî hin bîranînên na-  
xoş jî bi xwe re dibim. Lê ew bîranînên ku ji we bi min re ma-  
ne, di dilê min de rûmetên xwe yên taybetî hene. Dostê min î  
yekane hiin bûn fi we tenê ji min hez kir. Min didît fi dizanî  
bfi ku we çawa ji min hez dikir. Bi pişirîneke min, bi rêzeke  
nama min, hûn bextiyar dibûn. Divê êdî hûn xwe hîn bikin ku  
bêyî min bijîn. Hûn ê çawa bi tena serê xwe bimînin? Kîyê we  
ê hebe, dostê min î dilpak, giranbuha û yekta? Ez pirtûka  
xwe, gergefa xwe fi nama xwe ya nîvçemayî ji we re dihêhm.  
Dema hûn wan rêzikên nîvçe dbcwdnin, bidomînin ii dûmahî-  
ka wê jî di dilê xwe de bbcwînin: Ew hemû tiştên ku we dbc-  
west hûn ji min bibihîsin û min pê re ne digêhand ez  
binivisînim. Varenka xwe ya reben, ya ku ji dilûcan ji we hez  
dUce, ji bîr nekin! Hemû nameyên we di komodîna Fedorayê  
de, di çavika jorîn de ne. Hûn dinivisînm ku hûn nexweş in.  
Lê Mîrza Bukov nahêle ez îro gava xwe jî bavêjun der. Ez so-  
zê didbn we ku ez ê ji we re binivisînim, dostê min. Lê tenê  
Xwedê dizane bê ew ê diire çi bibe. Loma ji nuha ve em xatirê  
dawîn ji hev bbcwazm, dostê min, kavne min, dostê dilê  
min!.. Xatirê dawîn! Ax, mm çiqas dbcwest ku anuha min hûn  
hemêz bikirana!

181

Bi xatirê we, dostê min, bi xatirê we! Di xweşiyê de bûnî-  
nin! Bextiyar bin! Ez ê her ji bo we banî Xwedê bikim. Ax, ez  
çiqas xemgîn im! Mîna ku hati bim guvişandin! Mîrza Bukov  
banî min dike...

Heta mirinê dosta we



V.

NOT: DUê min wusa teng bûye û kelagiriyekî wusa U gew-riya min piçikiye ku ez dikun bifetisun. Bi xatirê we! Xwe-dêyo, ez wusa xemgîn im ku! Bila di bîra we de be, Varenka xwe ya reben ji bîr nekin!

Dayika min, kevoka min û dosta min ya bêhempa, Varenka!

We dibin. Hfin diçin. Jê dêla ve ku we ji min dfirbbdn û bibin, baştir bfi ku wan dilê min ji defa sîngê min derxista û birana! Ev çawa dibe? Hûn ji aUyekî ve digu-în ii ji aUyekî ve jî hfin diçin! Bi gavekî beriya nuha nama we ya kurt kete destê min, bi hêsirên çavan şU bfi bû. Dibe ku hfin naxwazin biçin, we bi darê zorê dibin; dibe ku dUê we bi nun dişewute, dibe ku hûn ji min hez dikin! Lê êdî hûn ê bi kê re bimînin! Dilê we ê li wir teng bibe, bicemide, bişikê; ew ê ji berketinê, ji kul ii kovanê biperite. Hûn ê U wan deveran bimnin fi di erdekî biyanî de werme vaşartin. Ê H wdr kesekî we jî tune ku U pey mirina we bigirî! Mîrza Bukov ê jî ji xwe re H pey nêçba keroşkan be. Ax, dako! We çi kir! Çawa destê we U we geriya fi we biryareke weha da? We çi U serê xwe kir! Ew ê U wir zfi we tetirxanî bikin ii bUcujin, horiya min. Hfin weke pûrta çfi-182

kekê narîn in, dayika min. Lê ez, ez î ehmeq U kuderê bûm, min çawa çavên xwe li vê yekê girt? Dema min dît ku dilpekiyekê bi dergfişa min girtiye ii hişê wê ne li serê wê ye, diviya bû min bi destê wê bigirta. Lê ava reş di çavên min de hati bii. Rasterast ez ehmeqek bûm! Li ser tişteki ne ramiyam ii

min tiştêk ne dît. Mîna ku hertişt li gor rastiya xwe diçe fi tiştêk bi min ne ketiye. Ez rabiim dikan bi dUcan U pey farbalayan beziyam...

Na, Vareiuca, ez ê ji nivînan rabim. Hêvîdar im heta sibê ez ê baş bibim ii ji nav nivînan rabim. Ez ê xwe bavêjim ber gironekên duruşka we fi ez ê nehêlim hûn biçin, dako. Na, ev ne gengaz e. Kê maf heye ku wusa bike? Ez ê jî bi we re werun! Ku hûn di duruşka xwe de cî nedine min, heta ku bêhn li min biçike, ez ê li dii we bibezim. Ma hfin dizanui bê hûn bi kuderê de diçin û çiqasî dûr e, dayUca min? Na, hiin nizanin, werui ji min bipirsin. Wir, berîyeke weke hundurê destê min rfitûrepal e, dayika min. Li wu tije teralên jinên gundiyan, gundiyan serxweş fi naşî ne. Li wir anuha daran bergên xwe weşandine, baran û sermayê dest pê kiriye. Ê hiin jî rabiine diçine ciyekî wusa. Mîrza Bukov bi kêmanî karekî xwe heye, ew ê biçê nêçira keroşkan. Lê hiin ê çi bUdn? Dibe ku hfin dbcwazin bibin jina xwedyekî wargehan! Lê weha carekê li xwe binêrin, horiya min, ma diriivê jina xwedyê erdan bi we dikeve?

Çawa tiştêkî weha dibe, Varenka? Ca bi xwe bifikirin, dayika min, ez êdî ji kê re nameyan binivisînim? Ji vir ii weha ji kê re bibêjim, «dayika min» û ez kê bi vî navê şêrîn bmavînim? Ma ez ê êdî we H kuderê peyda bUcun, horiya min? Ez ê bimirim, Varenka, rasterast ez ê bimirim. Dilê min debarî êşeke weha nake. Weke nfira Xwedê, weke keça xwe ya helal min ji we hez ku", tevî hertiştên we min ji we hez kk, dayika min, kela dUê mm. Ê ji bo we, tenê ji bona we ez dijiyam. Ka-

183

rê min î paknîvisê, derketin û gera min, pêjn fi ramanên xwe yên ku min di forma nameyên dostane de nivisand, hemfi jî ji bo xatirê ku hûn li nêzîkî min, li wî aliyê hewşê bfin loma, dayik min. Dibe ku we hay ji vê yekê tune bfi, lê rastiya xwe evbii.

Binêrin, dako, ka hiin bi xwe bifikirin, kevoka min, ma dibê ku hfin me bihêUn fi biçia? Na, ne gengaz e ku hfin biçm, qet nabe, berxika min! Binêrin baran dibare, hiin ji xwe nesax in, hiîn ê sermayê bigirin. Duruşka we ê şU bibe, bêguman ew ê bibe av biçe. U çer ku hfin bi derveyî bajêr bikevin, ew ê gironekck bişikê, duruşka we ê biqulibe fi ji hev bikeve. Ji xwe li Petersbûrgê duruşkan weke tîtikên zarokan çêdikin. Yên ku duruşkan çêdikin, ez wan hemfiyan jî nas dikim. Bi xemlfixêz î xweşikî ava dikin, lê bi kêrî tiştêkî nayên. Ez ji we re sond dbcwum ku ew saxlem çênakin. Dako, ez ê xwe bavêjim dest ii lingên Mîrza Bukov fi hertiştî jê re bi lêv bikim, hertiştî. Ê divê hfin jî bikin ku wd serwext bikin, pê bidine zanîn ku hiin dixwazin li vir bimînin, hfin ê nikani bin biçin. Ax, ew çima ne çfi li Moskvayê bi keça bazirgan re ne zewucî? Ez cUzanim ku keça bazirgan ê ji bo wî çêtir bûya. Wê çaxê hfin ê jî li ba min bimana. Ma we çî ji wî Bukovî ye? Ew çawa wusa ji nişka ve di çav we de bû yekî rfimetbiUnd? Na xwe ew hertun ji we re farbalayan dikire, loma? Ma farbala çî ne! Bi kêrî çî tîn? Ev tiştên vala ne, dako, vala! Li \ar jiyana merivekî (U hengemê de ye. Lê farbalaya ku tê gotin, perçekî paç e fi hew! Çer ku ez perê mehana xwe bigirim, ez ê ji we re farbalayan bikirim. Ez ê bikirim, dako. Ez dikanekê nas dikim, U

wir hene. Lê heta ku ez perê mehana xwe bigirim, hinekî xwe ragirin, Varenka, horiya min ya şêrîn! Ax, Xwedêyo! Ango bê peyv îî bê gotin divê hûn bi Mîrza Bukov re biçm berîyên hişk fi êdî venegerin!

Dayika min, divê hfin ji min re careke (Un jî nameyeke  
184

piçfik binivisînin fi hertiştî tê de bi lêv bikin. Û wexta ku hfin gêhîştin wir, dîsa ji min re binivisînin. An ne, ev nama min ê bibe ya da\wn, horiya min ya hûrUc! Lê na, ne gengaz e ku ev bibe ya dawîn. Ma tew dibe ku wusa ji nişka ve dawiya namên me bê! Na, nabe. Ez ê binivisînim û divê hfin jî binivisînin. Êdî stîla min jî ber bi başiyê (Uçe. Ax, dako, ez jî rabfime çêU stflê dikim. Anuha ez nizjinim bê ê(U ez çi (Univisînim fi çawa (Univisînim. Ez ni\dsa xwe ji nû ve naxwînim ka bê min çi nivisiye fi ez çewtiyên xwe jî rast nakim. Tenê ji bo nivisandinê, her û her ji we re nivisancUnê, ez cUnismim. Kevoka min, ruhuka min, dayika min!

1846

185

PIRTUKEN ME YEN KU DERKETINE

\* A.S. Pûşklî I KEÇA KAPÎTAN/Roman

\* A.P. Çêxov

I MIRINA KARMEND/Novel

\* Hesenê Metê (NMsende) / ARDÛ /Ji çîrokên gelêrî

\* RedwanêAll / TILÛRÊ BÊGANE/Novel

\* Hesenê Metê / SMIRNOFF/Novel

\* MûsaAnter / HATIRALARIM/Bîranîn

\* Mehmed Uzun / ROJEK JI ROJÊN

EVDALÊ ZEYNIKÊ / Roman

PIRTUKEN ME YEN KU DERKEVIN

\* Heinrich Böll / HERIMANDINA

JİYANA KATHAREMA BLUM/Roman

Adresa nia:

Wêşanên Welat

Box: 4123

141 04 Huddtngge/Swêd

WEŞANEN

WELAT

Her meriv, li hemherî herkesî û jiherti^tî

berpirsiyar e.

Dostoyevskî

\*\*

## MERYEMA

- Keçejinek ji zemanek din -

Roman

Sebrî Silêvanî

Diyarî

Bo hemû Meryeman ên ji keçîniyê hatine xistin

"وَلَمَنِ انتَصَرَ بَعْدَ ظُلْمِهِ فَأُولَئِكَ مَا عَلَيْهِمْ مِّنْ سَبِيلٍ إِنَّمَا السَّبِيلُ عَلَى الَّذِينَ يَظْلِمُونَ النَّاسَ  
"وَيَبْغُونَ فِي الْأَرْضِ بِغَيْرِ الْحَقِّ أُولَئِكَ لَهُمْ عَذَابٌ أَلِيمٌ"

Qurana pîroz

"Cîhan komedya ye ji bo kesê hizir bike û trajedî ye ji bo kesê hest  
pê bike"

Horas

"Em naxwazin di ûtopayê de, an di gizîrtek nihênî de, ku tenê  
Xwedawend dizane li ku derê ye, bijîn. Belê em dixwazin li vê cîhanê

bijîn... Cîhana me hemûyan e, ew cihê ku li dawiyê an wê me bigihîne xweşiya me, an jî wê me negihîne tu tişt î.”

W.Wirdzort

“Dema keçik ji dayik dibe, dibêje: Ez dizanim ku hûn ne li benda hatina min in, ez dizanim jî kesekî ji we serê min navê, belê ez hatim, îcar bihêlin ez mezin bibim, paşî porê xwe vehûnim û stranan bistirînim, wî çaxî min ji Xwedê divê ku zilamek li cîhanê hebe û biwêre bibêje min: ez ji te hez nakim”

Resûl Hemzatov

Yekê Tîrmehê

Tu dizanî ku îro temenê min dibe sî û şeş salên rebeq û hêj ez bi tenê me, belê tu nizanî ku ev e yekem car e ez bi hevaleyek a wek te re, rijd û sebrîn, di seqayek îrosî de, cejna zayîna xwe saz dikim. Bi rastî, heta duh jî ez dudil bûm, te vexwînim an na? Tu ji welatek Ewrûpî hatî û cejn li wan welatan tenê sema û tewizîn in. Lê, li wan welatan kul û hesret in, bi taybetî cejna zayîna bêmiradek a wekî min. Tu bawer dikî, eve yekem cejn e ku kesek bi min re şemalkan hil bike an vemirîne, guhdariya muzîkê bike, bi dilovanî min maç bike û bibêje: “Cejna zayîna te pîroz be.”

Min sedema xerîbî û havîbûna te zanî, belê hêj ez sedema vegera te bo welatî nizanî. Ma kî nabêje ji bo ku tu hevaltiya min bikî û bermaya salên temenê xwe bi min re derbas bikî? Ez hêvîdar im wisa be.

Hindek caran, mirov hevaltiya kesekê dike, an jê hez dike, bêyî ku nas bike û ji ber wan -Hindek caran- gerek e mirov berdewam hizirekê ji bo sibeha xwe bike, bi taybetî dema ku qarîs û bêzar dibe. Wisa diyar e ku hatina te wê sifêr û wateyek din bide jiyana min, an bi kêmî cejna zayîna min. Dibe ku, ji bo kesek a wek te dilsoz xweş

be ku guhdariya min bike, êş û azarên min hevpar bike, belê ez tama xweşiyê nizanim ji ber ku xweşî di jiyana min de pir kê m bû. Belkî tu bikarî hindekê min fêrî xweşiyê bikî, belê piştrast be, ez nikarim te fêrî xem û gazindan bikim. Bibihure, ez ne keçeke sadî me, mebesta min ew nîn e ku ez gumanê di rastiya hestên te de bikim û bibêjim ku tu bêxem û gazinde yi, na. Ji ber ku tenê kesê bêdil, bêxem û gazinde ye. Ez bawer dikim ku dilê te mezin e, belê dilê min jî ne biçûk e.

Narîn can, wî mafî bide min ku ez şanaziyê bi xem û gazindên xwe bibim ji ber ku keda sî û şeş salên mehrûmiyê ne.

\* \* \*

Ew ji min fam nakin, an naxwazin fam bikin. Ma kê gotiye ku ez dixwazim cîhanê biguherim an biherimînim? Na. Cîhan bi xwe diguhere û diherime, belê ez dixwazim tenê cîhana xwe a biçûk biparêzim ji bo ku hest bi penaberiyê nekim. Dibe ku ew zimanê ez pê dipeyvim heta radeyekê ji zimanê wan cuda be, belê ne biyanî ye. Hindek caran, ez hewl didim wî zimanî bo hemû rengan wergerînim, belê kê m kes tê digihin çunkî kê m kes ji hemû rengan hez dikin.

- Rast e, piranî ji du an sê rengan hez dikin!
- Mexseda min jî ew e can im.

Eve heyameke tu gelek pirsyaran ji min dikî û piraniya wan kesatî ne. Ez dera xwe nabînim, an naxwazim bersîva te bidim ji ber ku ez ji bersîvan ditirsim -wek hindek rayedarên van bajaran, çaxê ku pirsyara lîstên xerciyar zeravî li wan diqetîne- belê dem e ku ez li xwe mukir bêm û bibêjim, ku tirs bû sedema veqetandina min a ji vê civakê, her wiha bû sedema mirina behre û însiyatîvê di kesatiya min de.

Ew jî ditirsîn. Mafê wan heye ku bitirsîn ji ber ku bi tirsê firşik bûne, ditirsîn bi dengê bilind bihizirîn, pirsyan bikin, an behsê kiryarên xwe bikin bi taybetî di tariyê û xelwetê de.

- Kesatiya mirovî ji reftar û kiryanan pêk tê, mirov xwe fêrî tiştê baş tenê dike, belê ên din mirovê fêrî tiştê xerab dikin û tirs tiştê herî xirab e li ser vê xakê.

- Erê Narîn.

Em ji her tiştî tirsandin: ji Xwedê, ji roja qiyametê, ji cehnimê, ji turbê û pirsyanên Munker û Nekîr, bi xwe ji (xwe) ê sirgûnkirî jî di me hemûyan de.

Narînê, bizane ku tirs hesteke xweş e, belê seyr e jî. Mafê te heye ku tu bi axaftina min bikenî, rast e tu ji min fêm dikî, lê nizamim hest bi min dikî an na?

Li wan welatên sar, mirov ji xezeba demsalan û bacên hikumatê tenê ditirse, lê li van welatên şewitandî, hemû demsal wekhev in û bace jî tune ye, belê mirov ji gelek tiştên din ditirse, ez hest pê dikim lewre dibêjim tirs xweş e.

Tirs ji revîna berdewam ne tenê ji awiran, ji xweveşartinê ne tenê ji polîsan, ji gumanê ne tenê ji rûye dirêjan, ji vederiyê ne tenê ji pîrbêjan, ji têkiliyê ne tenê ji cîranan, ji şevê û şevpestan ne tenê ji dizan, ji xewê û xewnên xwelîkî ne tenê ji gaziya spêdeyan, ji bédengiyê û bihîstina berdewam ne tenê ji jinbavan. Her wisa tirs ji kêlîka demê çunkî ew dikare rastiya hestên min biselmîne demê ku her şev agirê hezên qedexê bender û pîrêzeyên min dişewitîne berî ku ez bi lihêfka xwe a gulgulî û piça şerma mayî, vemirînim.

Tirs xweş e, xweş e heta wê radeyê ku ez nikarim bêyî wê bijîm.

\* \* \*

- Hindek ji reftarên mirovan tu peywendî bi nasnameya civakan ve nîn e wek tirsê, axaftin û rastiye. Lewre jî, dema ku kesek ji me



biaxive, baştir e heger tenê behsê wan tiştan bike ên ku ew pê dizane, nas dike û pê çêdibe, da ku bêtir nêzikî rastiyê be.

- Xebera te ye Narîn, heta sibê mirov dikare biaxive, belê wê çi bibêje?

- Mebesta min jî ew e Meryema min.

- Takekesê me nikare bi kurtî peyama xwe ragihîne ji ber ku hêj zimanek saz nîn e bi taybetî zimanê hevpeyvînê, ji ber hindê pîrbêjî bûye nîşana rewanbêjîyê, wek ku tu dibînî, di nav civatan de dibêjin: filan kes bi dev û ziman” Her çendî kes têngahiye ka ew çi dibêje. Bibore, ew jî êşek e û em hemû vegirtine.

- Ez jî wisa bûm, belê piştî panzdeh salên xerîbiyê ez hatim guhertin, wexta ku min bêhemdî xwe welat li pey xwe hişt, min tiştê xerab bi xwe re nebîr û wexta ku ez vegeriyam jî min bi xwe re neanî.

- Pêwîst nake ku kes bi xwe re bîne çunkî bi xwe heye, tiştê xerab ew qas heye ku emrê me têr nake.

\* \* \*

Ez ê kaxizên xwe tevan kifş bikim, belê hêviyek min heye: Ku tu bikaribî guhdariya min bikî, hewl bidî ji min fam bikî, ji ber ku guhdarî û têngihîştin bûne diyarde, bi kêmî bo kesên bêkes û belengaz.

- Ez ji guhdariyê hez dikim, nexasim guhdariya mirovên ku çav li zîndîbûnê, wek te hunermend û bedewkar.

- Spas can im.

Gelek caran ez van her du peyvan spas û bibihure bi kar tînim lê hindê kes jê bêzar dibin, ez hêvîdar im ku tu ne ji wan bî.

Bi her hal, te zanî ku îro temenê min dibe çend sal û hêj bi tenê me, te zanî jî ku navê min Meryema ye, belê dem e ku tu gelek tiştên din jî di der barê min de bizanî, mafê te ye.

Bavê min Dêwalî ev nav ji bo min hilbijart. Ez li Duhok a Dasiniyan ji dayik bûm, li heman cihê salên emrekê bêdad diqedînim. Ne girîng e ez ji kîjan malbatê bim, ji ber ku tuxmê nêr hêvênî hestê hevbûnê li bal min nehêlaye, çunkî jî piraniya malbatên vê deverê wekhev in: bi du çavan dibînin, bi du guhan dibihîzin, bi du destan çepikan dikutin, bi dengê bilind dipeyivin, ji eynî rengan hez dikin û qedrê biyaniyan bêtir digirin. Xinêka wî kesê ku bikeve dilê wan, bi serê wî sond dixwin, posterên wî bi sîvandên xanîkên kevn û serderên vileyên nû ve dihilawisin, bi çavkên şîn dixemilînin da ku tu kes çavan lê nede, tevî ku baweriyê bi efsane û efsûnê naynin, lê ne xinêka wî kesê ku bikeve serê wan ji ber ku her sî û pênc salan carekê tenê serê xwe dixurînin.

Li gor pîvanên bedewbûna jina Rojhilatî, bi taybetî li welatên Ewrûpa, wek ku tu dizanî, ez ne kirêt im: bejnzirav, esmer, çavkew û gerdengaz im her wek dayika xwe, belê li salên dawiyê çend davên spî li porê min derketin, lewre jî kesê ku min bibîne, texmîn dike ku temenê min çil û tiştêk sal e.

Tu dizanî, hezkirina min bo zarokan xweristê dayikê li ser min dide, kesê beranber min têdigihîne ku ez dayik im û xwedan birek zarokan im, naxwaze bawer bike ku ez keçek qeyre me.

- Meryema min, tu bi hezkirina xwe a mezin bo derdora xwe, bêqam xwe diwestî.
- Narîn, çawan ez newestim û li vê deverê her tiştê ku ez xwe nêzik bikim, nêr dibe?
- Nexwe, em keçikên kezîkur çi bikin?
- Mixabin can. Her nêrek, bêyî ku pîramîdan ava bike, dixwaze bibe Fîrewnek û em li ber derazîнка erşê wî semayê bikin, belê xewnên me li kolanên teng û tirsdar tenê bi destperê bi dawî tên.

Ez têra xwe westiyam, ji her tiştî westiyam, ez bawer dikim ku hêza min di berdewamiya min de ye, ango bi dawî nayê, belê guman jî dikim ku êdî bikaribim bi tenê biqedînim. Ma tu bawer dikî Narîn, hindek caran ez hesûdiyê bi cariyên dibim?

- Ez bawer dikim, ji ber ku yasayê ew diparastin. Bi aşkerayî, bêxap, serederî bi wan re dihate kirin. Gelek keçikên wek min û te li vî bajarî ku tenê alayên rengîn û avahî tê de bilind dibin, hene. Hemû jî hest bi tenêbûnê dikin. Panzdeh salan li Ewrûpa, ez bi tenê bûm û niha jî bi tenê me, belê gava bêhna min malix dibe, ez Xwedê tînim bîra xwe çunkî ew jî bi tenê ye û dixwaze bi tenê biqedîne. Wisa diyar e ku ne her kes dikare bi tenê berdewam bike.

- Erê, wiha diyar e.

\* \* \*

Erê.

Ez, weku mê hatim vê cîhanê. Bi esehî li Yekê Tîrmeha 1970 an, her weku nasname dibêje. Belê Yekê Tîrmehê li ser nasnameya gelek kesan heye, bi taybetî kesên ku dê û bavê wan nexwendewar in. Lewre jî, Yekê Tîrmehê wek nimre û mêjû, tu wateyên taybet li bal min nîn e, belê wek bûyer û bandor jiyana min sed û heştê pileyan wergerand.

Ez zû hatim vê cîhanê, lê ne destvala, min birek pirsyarên tijî bersîv bi xwe re anîn, belê xuya ye ku hêj nebûye zemanê bersîvan. Mîna rêvîngên mandî li bin sîberên îstgehên bendemanê, ez li kêlîkên demên dawiyê dilezînim, li benda şemendefirekê me heta ku bê, min siwar bike û dûr bibe, dûr dûr, ber bi hindek îstgehên ku min nedîtîn.

Narîn, ez ditirsim bimirim û şemendefirê nebînim. Dûkêla wê di kevalên min de diyar dibe, belê ew bi xwe, na. Min got ku ez zû hatim vê cîhanê, ez nabêjim xwezî nehatibama, ji ber ku min hindek

xwezîkên din, mezintir, hene. Belê heger berî çend hezar salan li Babilê hatibama û di mihraba Mîlîtayê de, bo yekem car min xwe biavêta di hembêza zilamek biyanî de, wî çaxî her kesê ku bêhna zilaman jê bihata wê destê min maç bikira. Bêyî ku ez hilbijêrim, li zemanekî havî, min çavên xwe li ber tîrêjên havîna sor û gulîgenimên reş vekirin.

Li heyamên zarokiya sehend, min bi kelegermî û tehreyî ji havînê hez dikir, ji hemû demsalên din bêtir, heya radê xîretê. Hindek caran min cilên xwe diguhertin û bi keç û jinên taxê re, ji bo vêdana gulîgeniman diçûme deştê. Min hemû dergeh û pencerên xwe ji bo bêhna axê, ba û rengan vedikirin. Her bîstekê min alîkariya keç an jinekê dikir û di ber re guhdariya dengê wijdan û bêhişiya wan dikir. Min hez dikir qesrekê ji gulîgeniman ava bikim, li havînan zer, li biharan kesk û li demsalên din jî spî û sor wek porê dayika min.

Way!

Min bêqam ji havînê hez dikir, wê hizirê bike, hindek caran min ji xwe re digot: “Heger bi destê min be, ez ê havînê bikim salek û ne tenê demsalek.”

Min ji bîr dikir ku xelkên din li demsalên din hatine. Belê ji sêzdeh saliyê de, havîn li ber min sar bûye çunkî nikarî xwe li hember hêza bawerî û hezkirina min ragire, baweriya min bi hersê demsalên din jî hejand, lewre ez li demsalê pêncê geriyam. Sêzdeh havînan wek keçek sade, hêvîxwaz û xewnedar ez berdewam bûm, belê piştî hîngê, bîst û sê havînan wek nesaxek penceşêrê girtî, kêferatê dike berî ku bi dawî bê. Wek ku tu dizanî, di kultura me de dawî angoya mirinê dide, min bawerî tenê bi destpêkê heye, destpêka jiyana û azadiyê û ew kesên ku ji min hez dikin -nizanim hêj ji min hez dikin

an na- qenc dizanin ku wê piça baweriyê dawiya min bîst û sê salan paş xistiye.

Narîna min, wek her Kurdek din li vî welatê ku yar û neyaran bi xwe ve matil dike, min jî gelek bi çavê serê xwe ditiye, wek her jinek din li vê serdema serberdayî ez jî têra xwe hatim çewsandin, belê min hindêk bûyerên din jî dîtine dibe ku gelek kes naxwazin bibînin, bi taybetî jinên bajaran ên nazdarkirî û zilamên wan ên fermanber.

\* \* \*

Serê çend salan e û ew bi pistepistê gazindên xwe bo hev dikin, xemên xwe ên erzan bi hev direvînin.

Wey li rojgara bêtûte, berê pêkguhertina keçikan bû, belê niha a derew û berjewendiyan e... ez jî rebena Xwedê hêj bêdeng û guhdar im. Min dera xwe nedidît ku behs bikim çunkî behra min birek nihênî û taybetmendî bûn û li ser vê xaka ku bi kuştinê pîroz, her tişt ber bi pîroziyê diçe, belê tenê mirov, xwîn, nerênî û taybetmendî bêbiha dimînin.

\* \* \*

Narînê, berî niha min ji te re gote: “Tenê kesê bêdil, bêxem û bêgazinde ye”, ez bawer dikim ku dilê min bêendaze, belê ez çî bikim heger ji xeyrî te û van kevalên hunerî, min guhdarek ji xwe baştir nedîtibe. Bila kes dilê xwe bi min neşewitîne ji ber ku sermayeya min ne tenê xem, gazinde, nerênî û taybetmendî ne, belê di navbera van û wan de xweşiya min mîna kevokek birîndar li sahiya asîmanê min difire berî ku li nava heriya pêlavên wan xwe vekute. Ez wiha me, bêyî firîna kevokan nikarim li hindavê binêrim û hîngê kevokên min difirin gava ku ez rastiye dibêjim: rastiya wan û jiyana jandar bi xwe heger hindêk caran ne li gor hezên kesatî jî be, belê ez nizanim ka kingê û li kîjan asîmanê kevokên wan difirin.

Li van herêmên ku tenê nan, jin û atmosfêr germ, bêdengî car debengî ye û car jî biyanîbûn e. Beriya niha, kesekê nedizanî ez kî me, an çî bi serê min hatiye, lewre jî kesekê nedizanî çî ji min re bike. Min wisa xwe têdigihand. Belê, piştî ku zanîn jî, bi tiliyên eşhedê ximximkên xwe paqij dikin. Bo dîrokek hêj nehatî nivîsîn diselmînin, ku tu cudayî di navbera zanîn û nezanîne de nemaye, bi kêmî dema ku hêsir dibin şîfre.

\* \* \*

- Xem nake Meryema min, hinavên wan mîna volkanan difûrin, ma tu dixwazî ku biteqin?
- Na, naxwazim. Mixabin, a ku hatiye serê wan besî wan e.
- Zû ji bîra dikin.
- Erê Narîn. Xebera te ye. Li heyamên cefayê, dema ku berîk vala dibin, wek serbazên cengên kendavên mirinê, stûxwar û melûl, li ber siya diwarên bêdeng, dibêjin xweşiya me tenê derewek e û em qîma xwe pê tînin... û gelek tiştên din jî dibêjin.
- Tu dibêjî xweşiya wan, heger ku hebe, di çî de ye?
- Ez bi esehî nizanim, lê dizanim ku ne gotina di rastiyê de ye.
- Nexwe?
- Bi rastî ez nizanim. Lê, pêwîst nake ku ew xwe aciz bikin, an îtirafê bi gunehan bikin an pesna nebeziya dêhlek a mîna min bidin wek ku ew dibêjin. Ew mecbûr in min red bikin, da ku nerêniya derengmana wan kifiş nebe. Pêwîst nake jî mîratê êş û azarên xwe bi derbirînen seqet bêwate bihêlin û dilê tu kesî bi xwe bişewitînin, her tişt ji dîmena wan xuya ye. Dîmena her yekî ji wan bûye xerîteya kesatiya wî.
- Lê, carinan, dîmenan pêwîstî bi çek an peyvan tune ye, nemaze dîmenên sosretane. Kesê ku ji hunera rengan fam bike ji her kesek din bêtir bi vê rastiyê dizane.

- Dibe.

Lê di der barê min de, ez cuda me, ne her tişt ji dêmê min xuya dike ji ber ku vê salgarê ez wek mûmyayeke Fîr'ewnî qedîd kirime, belê tevî wê jî, hêj gelek tişt di kûrahiyên min de zindî ne wek xem, gazinde, nihênî, taybetmendî û li şûna kevokekê, revdek kevokan. Narîn, ne guneha min e ku ez bi wan dehisim û ew bi min nahisin, wan dibînim û ew min nabînin, dibim rastiyeke di derewa wan de û ew dibin derewek di rastiya min de. Çêdibe ku em bi kelevajîya xwe wekhev bin, belê bi keder û xemgîniya xwe ne wekhev in. Ew, min rebeneka sefî dibînin û tinazên xwe bi azar û rastbêjîya min dikin. Ez li wan nagirim ji ber du egeran. Yek, Li gor îstatîkê, her pêkhatek li ser du astên cuda xwe ava dike, astê ruhê û astê form û bercestekirinê, vêca ne ruhê wan saz e û ne jî form û bercestekirin weku bûnewer. Ew hîn bûne ku serederiyê tenê bi mêyitiya jinê re bikin, belê gewherê wê mandel dikin, hizirên wê di hêlînan de çengo dikin, hestê wê diperitînin û cesedê wê dixwin, belê newêrin bigihin ruhê wê ji ber ku dûr e, li pişt sînorên mirinê ye. Du awayên şîzofreniya wan heye, angû nexweş in û nexweşî ne tenê di kesatiya wan de peyde bûye, belê di navbera wan û qencyê de, di navbera wan û aliyê beranber de, di navbera wan û lojîkî de, di navbera wan û rastiyeke de, her wisa di navbera wan û min jî de.

Bibore Narîna min, belê serê çend salan e û ew jinê wekî makerekê dibînin, xerabê wan lê siwar dibe û qencê wan barê xwe lê dike û ê bêdeng jî dixwaze devê wê lixav bike. Belê ew roj çû... Çûnek bêveger. Jinê biryar da, erê biryar da ku bi axive û şahidiyê li ser kiryarên hemûyan bide, bêawarte.

- Ew şahidiya te kêmbînin!

- Rast e, ji ber ku ez jin im. Lê, ne xem e. Her kes li gor bînahiya çavên xwe dibîne, xuya ku ew ne bi çavan, belê bi hindek endamên din ji laşê xwe temaşeyi jinê dikin. Sond bi Zarê Mezin ku ji îro pê de ez rastiyê tenê bêjim.

\* \* \*

Bi yasayek bêsaye, selefî û kevnar, wan ez dadgeh kirim. Guneha min tenê ew bû ku min bawerî bi wan anî û min xwe yek ji wan hesiband, ev car min bawerî bi bazbend û hemaylokan û bi ezmûnek dêrîn û stewr anî. Heqê qencyê, keçîniya min bêdemsal hêlan û niha li şûnwarên demê, bêhûde, hewl didin li bêgunehiya xwe bigerin, belê cihê ku pare lê hebin bêguneh lê tune ne. Ez jî gunehkar im, ne ji ber ku pîs an xerab im, nexêr, lê ji ber ku hêj çirayên hêvî û lêborînî di tarîstana min de hil in.

Miraza min ew bû ku ew carekê bi tenê yeksaniyê berceste bikin, biselmînin ku bi rastî ew xelîfên Xwedê ne li ser zemînî, miraza min ew bû ku dadgehek bi edalet saz bikin da ku her kes bigihe mafê xwe, belê wan muhlet neda. Bêbelge, bêşahid û mafê berevaniyê min dadgeh dikin û sizayê min ew bû, ku her kes dê bikaribe ji piyan ve mîzê bike, ji min bireve. Bîst û sê sal e û ez a nalebar li ber dilê xwe didim û gumanê di behaneyê hebûna xwe de dikim.

- Li ber dilê xwe bide Meryema min, mafê te ê rewa ye, belê gumanê di behaneyê hebûna xwe de neke, bizane ku roj ne jixwe dihele.

- Ez ditirsim...

- Netirse.

- Ez ne ji zanîna wan, belê ji nezanîna wan ditirsim.

- Ew ditirsin... Mafê wan heye bitirsin.

- Erê. Ez jî wisa difikirim.



Wan gelek tişt hene li ser bitirsin, lewre newêrin zû bi zû biaxivin, nahêlin jî kes biaxive da ku sûrên wan spî neke. Belê, ji xeyrê gotina rastiye min tu tişt nemaye ez li ser bitirsim. Sûcê wan e, heger tiştêk din bo min hêlabûna, belkî jê bitirsiyama. Me ji bo pir tiştan şehîd dan, ez jî amade me bibim şehîd, şehîda rastiye.

Dibe ku heya radeyekê ez bi kêr neyem, dehmenpîs bim, necis bim, û ew tenê neyik e bo civaka me. Belê bi bêgunehiya xwe, bi jandariya xwe, bi birîna xwe a hêj germ, bi mafên xwe ên sade û rewa, ez pakîzan im.

- Bi kurdperweriya xwe jî, wê ji bîr neke!
- Dibe Nara min, belê pîvan û danasîna kurdperweriyê hatine guhertin.

Ez ê kêr biaxivim û bila ew têr biaxivin. Belê ez bi dengê bilind û ew -wek her car- bi dengê nizm. Merc nîn e ku tenê kesê mend û şermîn bi dengê nizm biaxive, ji ber ku li herêma Rojhilatê diz, xayin, hindêk caran dektator û bêjerên televizyonan jî bi dengê nizm diaxivin. Her wisa kesên jar û jibîrkirî jî bi taybetî dema ku av û enêrjî û panzîn qut dibe. Cudahî di navbera me de wek Berzexê ye, ez xwe tenê naaxêvim ji ber ku min bawerî ne tenê bi xwe heye, belê ew xwe tenê diaxêvin ji ber ku bawerî tenê bi xwe hene.

- Ez têdigihim Meryema, lê hezkirin dikare hindêk wateyên baş bide cudahiye.
- Hezkirin?
- Erê!

Hezkirin serê sebebê ye

Hezkirin:

Min bêqam ji bavê xwe hez dikir, hezkirina wî ez han dam ku ji zilamên cîhan ê tevan hez bikim bi taybetî ên wek wî hêmin û rehet.

Belê, piştî heyamekê ez dilsar bûm, li çilê zîvistana 1981'ê, dayika min Helîma kirasê xwe diguhere û hêj salvegera wê nehatî, jinbava min Mencol cihê wê digire. Min bawer dikir ku kes cihê kesî nagire, belê Mencolê baweriya min pijikand. Piştî mehr û veguhaztina wê, ez ligel xwe havî bûm, belê min nedihîşt li min xuya bike da ku bavê min neqehire.

\* \* \*

Xuya ye ku dem pirsyaran çêdike û pirsyar bandorê li baweriyê dikan.

Li bîra min tê, carekê li kilasa şeşê seretayî, Mamostayê perwerdeya ayînî di dersê de bi şanazî got: “Li dû dînê Îslamê, mafê zilamî heye heta çar jinan jî bîne” Qet ji bîra min naçe dema ku min bi sersamî pirsyar araste kir: “Seyda, çima mafê zilaman heye lê mafê jinan tune ye?”

- Bi kîjan bersîvê qîma te anî?
- Na ruhê min, qîma min ne anî. Yekser sîmayên wî pêtî bûn, spîlkên çavên wî sor bûn, demarên eniya wî wek tîremaran xwe li hev aland. Te digot qey ez di xeta Quranê de xelet bûme, ku min kufrî kiriye neku pirsyarek. Bi gewriyek xinzirî li min heytand, lê bêdengî li hawara min hat û pelên wî vemirandin. Wî nikarî dersê berdewam bike, dergeh li pey xwe hêla û pirsyara min jî li nav xweliyek sarûbar hêla. Sal bihurîn û şagirdan reaksiyona Mamoste ji bîr kirin, lê pirsyara min ezber kirin.

\* \* \*

Bibore.

Wexta ku ez li hemberî kevalekê vala radiwestim, penayê bo rengan dibim, lê wexta ku diaxivim penayê bo peyvan dibim. Heta reng û peyvan jî azadiya xwe stendine belê hêj em dîl in, dîlên qedera xwe ne.

Paşî, neh mehên Mencolê zû qediyân û birakê min Kovan bi yekem qîriyê ragihand, ku jiyana wî wê ji a min bextewartir be, tenê ji ber ku ew nêr e. Dewletserê qelemî, min roja zayîna Kovanî a rasteqîne, ew jî li 4'ê Hezîrana 1982'an tomar kir, min nehêla bikin Yekî Tîrmehê.

Bavê min gelek ji Kovanî hez dikir, dibe ji ber ku kurê nexrî ye, an ji ber ku daye bi wî ve... Sîs, çavşîn, pozê wî zirav û erzinka wî biçûk mîna mirovên Îskandînavî. Lê bavê min xweha min Kajîn nedîtibû, ew di zikê Mencolê de bû, tenê avleme bû. Kajîn mîna dayika xwe kej, bejn kurt û lêvtenik e, belê ji ber pozê wê ê dirêj, çavên wê hûr û nêzikî hev, xuya dikin. Ew berevajî dayika xwe Mencolê a kîndar û sêrebend de, keçeke nerm û nazik e.

- Ez bawer dikim, ji ber ku kulîlk ne tenê li baxçeyan şîn dibin.
- Erê.

Bi rastî jî Mencol kîndar û sêrebend e, belê kesatiyek balkêş heye, bi xeml û xêza xwe jinên taxê tevan çîz dike, bi awirekê ji çavên mest, an livînekê ji kemaxên wek ên kêrûşkan, destinimêja zilaman dişikîne. Mîna kurelawan, porê xwe kurt dike, abrûyên xwe li ser tayekê dihêle, lê dem bo demê takên nû li qeraxan kate didin û madê wê bêtir seksî dibe, ew dizane ku zilam ji serikên mûyan hez dikin. Bi kirasên teng û rengdar bejna xwe dixemilîne, belê sînga xwe heta kefçika dilî hilêvirî dihêle, zexmê wê xuya dike, ew berdewam dibêje: “Bedewbûna jina bi temen bersînga wê ye!”

Mîna gelek dayikên ku dixwazin spehî bimînin, wê jî zarokên xwe ên sava bi şîrê kudikan xwedan kir ji bo ku memikên wê vepengizî bimînin, vil û şor nebin.

\* \* \*

Piştî ku dayika min gihaye karwanê spî û sebrîn, ez bi tenê mam, bêtir bi bavê xwe ve hatim girêdan, belê baweriya min bi paşerojê

kêm dibû çunkî hindêk caran dihate guhê min ku zilamên jîmirî bêsoz in, berevajî jinan. Çîroka wî zilamî dihate bîra min dema ku li ser gora hevjinê xwe, çavê xwe li jinek din digerland. Ez perîşan û posîde bûm, bêhemd min pena bo hêza xeybê bir. Wek ku tu dizanî, li demên tengav mirovê Rojhilatî penayê bo hêzên xeybê dibe. Zate xwe, weku jêder bo qencî û xerabiyê, mandel dike. Li xelwetgehê, ez ligel xwe diketim şerenîxê, min digot:

- Bavê te zilamek nestêle ye, hêj bi ser xwe ve ye û guneh e ku temenê mayî bi tenê biqedîne.
- Ez wê dizanim, belê ez û dayika xwe jî guneh in.
- Lê dayika te miriye!
- Dayika min namire, ez hez nakim tu carek din wiha bibêjî.
- Mir û çû, lê bavê te hêj zindî ye, nehêle ew jî bimire!
- Hûn zindiyan dikujin û miriyan diparêzin belê ez...
- Tu...?
- ...!
- Tu ditirsî ku bavê te jineke din bîne?
- Ditirsim ku bavê min min bi tenê bihêle!
- Netirse, te bi tenê nahêle. Ne wek her zilamî ye, wisa diyar e ku tu wî baş nas nakî.
- Ez têra xwe tevan nas dikim. Belkî kes cihê kesek din bigire, lê kes ne wek kes din e. Dema dibe mesela jinê, hîngê piraniya zilaman wekhev dihizirînin û bavê min jî zilam e.
- Hîna zû ye ji bo wî, mafek rewê heye ku jinek din bîne!
- Mafê çi, kê ew mafe daye wî?
- Civak û şerî'etê.
- Ma ew civak û şerî'et hizirekê ji bo hestên dayika min nakin? Heger ew jî wek te bibêjin dayika te mir û çû, nexwe ez hêj sax im,

bila hesabekê bo jiyana min, hestên min, bext û çarenivîsa min bikin.

- Ev suneta jiyane ye.
- Suneta jiyane an a zilaman?
- Dilê min bi te dişewite.
- Rast?
- Ma qey tu gumanê dikî?
- Dilê min jî bi min dişewite, lê...
- Lê tu dikarî bihêlî ku bavê te bêtir bijî, tu dikarî jî lezê li mirina wî bikî.
- Kê gotiye ez dikarim? Ma te ji bîr kir ka ez kî me? Ez keçeke sêwî me. Ez nikarim, lê bavê min dikare min biparêze, bila tu jinan neyne, soz û qerar be ku ez şû nekim, tenê xizmeta wî bikim.
- Belê hindek kar hene tu pê nikarî.
- Ez ê hewl bidim.
- Meryema min, tu ji min fam nakî.
- Ez ji te fam nakim, de hûn ji min fam bikin.
- Hûn?
- Erê. Tu, civak û şerî'et.
- Ma qey ji bîra te çû? Bavê te her dem kumê xwe ji bo xwe dikir qazî, vê carê tu kumê xwe ji bo xwe bike qazî.
- Heger jinek din anî, wê gavê tu cudahî di navbera wî û zilamên din de namîne.
- Hêj jin neaniye.
- Ma heger anî?
- Ê heger neanî? Bizane ku ew xatirê te digire, biryara ku tu bistînî ew ê bipejirîne, belê kî xatirê wî bigire, kî biryara wî

bipejirîne? Ez dibêjim tenê kesê jê hez bike û ez bawer nakim ku li ser darê dinê kesek ji te bêtir ji wî hez bike.

- Ê Mencol?

- Ew ne a hez kirinê ye, xwe li dor bavê te dialîne da ku wê mehre bike. Jinên wek wê şareza û xwedan ezmûn, aqilê xwe bi kar tînin, ne ku dilên xwe. Bi kurtî, li mêrên têr digerin da ku rewşa jîn û jiyara wan dabîn bikin. Bavê te vê rastiyê dibîne lê ji mecbûrî çavên xwe diniqîne.

- Guneha min û a dayika min di stûyê we de ye.

Zemawend

Kesê bibêje ku zîlam bi hêz in û jin lawaz in, ew qarçikê xeyrî xwe dicû, berî wiha bibêje bila xwe serkol bike û siyên gumanê bide tavê, ji ber ku eve bîst û sê sal e ez berhingariya tenêbûnê dikim, belê bavê min salekê tenê jî nikarî. Tu car ji bîra min naçe, dema ku ez bi cilên reş û Mencol bi xêliya spî ketine ber hevdu. Ewê rojê, min pinpinîk li hindav pawanên dêmê bavê xwe dît in dema ku difiriyên, lê wî masîkên mirare li qeraxên deryayên çavên min nedît in dema ku xwe digevaztin. Bi dirêjîya şevê ew û Mencol li cihekî, li pêş tixûban, gihane hevdu û ez û dayika xwe jî li cihek din, li pişt tixûban. Mirinê dayika min ji min stend û Mencolê jî bavê min, lewre jî di piraniya kevalên min de mirin û Mencol bûne hevheîma.

Paşî, min serê Mencolê xwar, li Tekê Tîrmeha 1983'an, cendekê bavê min giha Duhokê piştî ku li Cengê Kendavê yekê, li Başûrê Îraqê, hatiye kuştin. Li destpêkê min ji xwe re digot: "Derew e, bavê min namire." Belê piştî ku dengê gaziya Mencolê bilind bû û ew bi xwe nizm, min hêvî kir ku rast be. Ez nemînim, nizanîm çawan ji devê min derket, min serê xwe bilind kir û bi coş got: "Qenc lê hat."

Li goristanê, ez û Mencol li beranber hevdu sekinîn, nizanim çima min dixwest ew nêzikî min bibe, belê dema ku ew nêzik dibû, ez dûrtir dibûm. Mencolê porê xwe veçerand, bersînga ku wek şûşeya gulavê parastî da ber hutkan, kilê çavên wê bi lehiya rondikan re teqlî, şîname vedigeriya, digot: “Dêwaliyê min, te ez rebena Xwedê ji bo kê hiştim, te Kovanê xwe ji bo kê hişt?” Bêtir ji carekê hewl da xwe bihavêje di binê ziyaretî de, belê zilaman nedihîştin, bihiştana jî her min nedihîşt ji ber ku Dêwaliyê wê biryara xwe da û giha dayika min Helîmayê.

- Silav li canê her duyan bin.
- Spas Narîna min.

Lê, bavê min wesiyetek hebû. Mirin hejarî ye û mirî hejar in, bi xwe wesiyetan jî ligel xwe nabin. Ez dizanim ku tu nizanî lê ez ê bibêjim. Bavê min digot: “Di şerî de, delîveyên mirinê ji ên jiyane bêtir in. Dinya ye heger ez mirim, darbestê bo veguhastina cendekê min bi kar bînin, hişyar bin sendirîkê bi kar neynin, min li cihekî bilind wek Şaxkê veşêrin” Belê Mencolê wesiyeta wî bi cih neanî.

- Çima?
- Ji ber ku jineke edxem e.

Li nav cimandiyê behîdaran, min hest dikir ku ez vexwendiyêke biyanî me li helketek bêjivan, tenê bavê xwe nas dikim û ew jî bi kefên rapêçane û behîdar axa sor radidin ser. Dihate ber çavê min ku dem êvar e û ew bi merê li nava bîstankê hewşa me xwe mijûl dike. Ligel dengê telqînê ez veciniqîm, li dor kêla serê wî zivirîm her weku zemawend, paşî li dor kêla serê dayika xwe Helîmayê, min diviya ez bifirim, lê her du baskên min ji her du kêlan girtin û ez daketim ser devê xwe.

\* \* \*

Her kes giha heqê xwe. Dayika min giha dawiya xwe, bavê min giha dayika min, paşî Mencol jî wê bigihîje lûtkeya stem û rezîliyê. Dewletserê bavê min, paşî mîrat hemû wê bibe para wê... Xanî, ratibê şehîdan, parçeyê erdê ku roj bo rojê bihayê wê bilind dibe, pirên peywendiyê û bîrhatinên ne xweş.

Lê, her bêhna wê nedihat, hest dikir ku samanê min bêtir e ji ber ku hêj ez keç bûm, dehmenpak bûm.

\* \* \*

Peyvên serxweşiyê û taviyên êsiran li hawara Mencola belengaz dihatin. Lê, tenê bêdengî li hawara min dihat, min wisa dihizirand, belê vê carê bêbextî li min kir û ez dagir kirim. Seqayê Tîrmehê germ bû, lê ez diqerisîm. Te digot qey ez im cendek, ne bavê min. Xwîna min dicemidî, laşê min ditezî, keziyên min mîna du reşmaran bûn li ser milên min, nedihîştin kes nêzikî min bibe tevî ku ez mîna zilamekî dihatim ber çavan ji ber ku min gumlekê bavê xwe ê reş û xetxetî li xwe kiribû û dersoka wî a belek avêtibû serê xwe.

Dibêjin: “Bêdengî nîşana razîbûnê ye”, Lê bêdengiya min nîşana tiştêk din bû, min dizanî ku dawiya wê nexêr e, belê min nedizanî ku wê kesên bêdeng mîna Mencolê û Kabirayî “Mihemedê Meyrê” fêrî dengkirinê bike.

Kabira

Eynî êvarê li bingehe hawarhatinê li nexweşxaneyê Azadî -wî çaxî bi navekî din bû- her du çavên min ên çilmisî bişkivîn, wek birîndarekê ji bûseyê verestî ez li ser textek spî û bêmerêz dirêjkirî bûm, serê min li nişîv û piyên min li evraz. Her bîstekê, firêştên spî belê bêçeng, dêm û gerdena min şil dikirin ji ber ku dereceya germa laşê min digiha çil û duyê.

Min gotibû ku dawiya bêdengiya min ne xêr e, tu nabêjî li goristanê dilê min dibihure û ez li ber piyan girêle dibim, cîrana me “Meyrê”



bi alîkariya Kabirayî -Xwedê jê ne razî be- min vediguhêze bingehê hawarhatinê. Narînê, ne adetê min e ku ez nifiran li kesekî bikim, belê guneha wî pêzevengî bi xwe ji a Îblîs mezintir e. Piştî ku çavên min beq dibin û ez bi ser xwe ve tîm, Meyrê eniya min maçî dike, paşî bi mîhr û dilovaniya dayika min Helîmayê min hembêz dike, ev car hûrayên dilbihurînê vedigere.

Meyrê hurmetek bêdûnde ye, temenê wê gihaye pêncî û sê salan û hêj bêhêvî nebûye, berdewam qesta mezargehê seyîd û weliyan dike bi taybetî ê “Şêx Se’diyê Balqosî”, jinek maqûl û nestêle ye, kesatiya wê a sengîn wiha dike ku her kes rîzê lê bigire bi taybetî jinên taxê ên temendar, çunkî derbirîna jina sebrîn û qurban dike. Li demên şevbihêrkan, li baxçê me, bavê min bi awayek bisteh ji wê re digot: “Bawer neke kes ji me bêguneh be, belê guneha te ji ên me tevan mezintir e çunkî te şû bi vî Kabirayî kiriye.”

Her wisa nedigote Kabirayî: “qeda li te bikeve” belê digot: “hindî tu sax î, nanekî bixwe û dehan bi xêra serê Meyrê bide.”

\* \* \*

Meyrê, bi rêka telefonê peywendiyê ligel Kabirayî saz dike ji bo ku amade be û bi tirimbêla xwe me bizivirîne malê. Heta ku em gihandin “Girê Basê” hezar caran digot: “Ez şûna rehmetiyê bavê te me” tevî ku di neynikê re bi çavan ez dixwarim. Hestê min digote min ku ew derewan dike, ji ber ku dixwest bavê min her dem dût bimîne da ku ew û Mencol bi serê xwe bikevin. Hêj bavê min sax, ew her du digihane hevdu, car li bengela serbanê qesra wî a şerqî û car li dikana wî a erzaqî piştî ku xebeng dianî xwarê. Ew jî wek gelek zilamên din li vî Duhokê, çavhîz û dilpîs e, geh wek zêrevanan li ber derê dikanê radiweste, baq û kemaxên jin û keçikan dipêve, geh jî li ser kursîka darîn wek serkomarekê Rojhilatî xwe pehn dike, dengê radyoyê bilind dike û çavzilkanê bi keçik û jinan re dike. Ew keç û

jinên taxê tevan nas dike, rêka herî kurt ji bo dilê wan dizane lewre zimanhilû ye. Bi van her du peyvên hewadar “belê” û “lebê” xwe şîrîn dike bi taybetî ligel bûjin û keçikên sinêle.

Min serê Kabirayî û Mencolê her duyan nediviya. Ez ji wî ditirsiyam û li ser Mencolê ditirsiyam, belê wan ageh ji bayê felekê nebû bi taybetî Mencolê, her weku qeyre û şehitî. Min digot çawa be jinbava min e û gereke ez lê miqate bim. Ez biçûk bûm, ne a şîretkariyê bûm, belê hindek caran min erkê xwe ê exlaqî bi cih diîna û ew pê agahdar dikir ku Mihemedê Meyrê zilamek bednav e li taxê, xelk gumanê di raz û niyazên wî de dike, bi taybetî der barê têkiliyên wî bi keçik û jinan re. Min amaje bo dikir, ku aqilê bavê min ji wî nabire çunkî ew hîz e, serjinik e û ne cihê baweriyê ye, lê belê Mencolê ew diîna serê min a ku ba nayîne serê kûnê reş, car ez dikirim pateyekî bênivêj û car jî dorka xêrê û li dor serê wî dizivirandim.

Ji bo ku Mencol xwe biparêze, dest bi êrîşê dikir. Dema bavê min li bêhnvedana pêncşemb û îne dihate malê, Mencolê wek bûkan xwe dixemiland û nedihîşt ji xeyrî wê kes din bibîne. Her wisa hewl dida bi rola dayika dilsoj û xemxur rabibe, bi fend û fêl, bi lixêzî digote bavê min: “Meryema keçek nûgiha ye, ez mîna dayika wê me û pêwîst e ew guhdariya min bike, an wê pîs û pîs tûş bibe” lê negot ka çawan wê tûş bibe.

Axavtina wê zû çû di serê bavê min de, lewre li her carê berî ku xatira xwe bixwaze, amojgarî li min dikir, digot: “Keça min, bi a Mencolê bike, ew şûna dayika te ye, dilê wê bi te ve ye, çî bibêje bizane ji bo xêra te ye.”

Mencolê dizanî çawan wî têbigihîne, lê min nedizanî, an min nediwêriya ji ber ku ez ji dawiyê ditirsiyam. Belê pašî min zanî ku tirsê li min kire dereng. Tirs nikare valahiyê tijî bike.

Berî ku bavê min malavahiya dawiyê bike, pêzanînên min li ser reftar û livînên Mencolê kê m bûn, lê gumana min gelek bû. Belê piştî malavahiyê, pêzanîn zêde bûn û guman kê m bû. Ferhenga min tibabek ji peyv, wate û zaravên nû tomar kirin wek “Dudilî, xweragirî, helwest, berpirsyarî, xemxurî û xwegorîkirin.”

Hîngê, kesekî şareza li derdora min nebû, ku min ji hest û helwesta min agahdar bike. Sêzdeh salî bûbû duriyana temenî û temen jî bûbû xusareta mitirban. Piyan ez revandibûm, navê min wek xwe ma, belê xwîn û sîma hatin guhertin, bersîngên min vepengizîn, cihên hestdar bi mûyên reş û tenik hatin nixumandin, sorîlankên serê min fêrî firînê bûn lê nizm. Min hestê hevalbendiyê bi zarokan re nema ji ber ku ez ligel keçkên hevsal û jinan bêtir radihatim, belê ez dibûm cihê tinazên Mencolê û hevtuxmên wê ên hestîgirî ji ber ku nedikarî guherîne bipejirînin.

Pirsa fîzyolojî êkcar bi zehmet bû. Min nedikarî zû bi zû biguncînim. Her wisa kartêkirinên wê ên dijwar bi taybetî xwîn, êlincî, zîz û bêzarî.

Wî çaxî ji her çaxek din bêtir ez hewcedara dayikê bûm, ji nû min zanî ku dayika min zû ez hêlam.

Mîna penaberên salên 90'î ji sedsala bihurî, ez li hêwirgeheke aram geriyam, belê bêyî ku sînorên cografyayê bibezînim. Pêjna min nedihat, min hez dikir li ser rewşa xwe bi axivim, belê min nedizanî çawan derbibirim, ne min dera xwe didît ji kesî re behs bikim û ne kesî dera xwe didît hest bi min bike. Wek reaksiyonek xwezayane, min hindêk xîçik û mîçik li ser bergên defter û pirtûkên dibistanê

kişandin, paşî dengê biyanî hat guhê min, got: “Meryema, ne tenê pît, lê reng û xîçik û mîçik jî dikarin bibin ziman bi taybetî bo derûnê.”

Ji hîngê de ez pirsyarê ji xwe dikim: “Çawan ez tiştan nîgar bikim, wek ku dibînim an dihizirînim?” Û hêj nizanim. Ma tu dizanî Narîna min?

- Na, Meryema min. Lê Pablo Picaso dizane.

Zemanek din...

Piştî ku Kabirayê stûşikestî em gihandine taxa Girê Basê, Meyrê ji qenciya xwe ez birime mala xwe. Ewê dizanî ku xanîkê me berteng e û pir e ji behîdaran, piraniya wan ji xizm û kesûkarên Mencilê bi xwe bûn.

Meyrê hez dikir hindêk qencyên dayika min Helîmayê ji ser xwe rake, nivînên xwe ji bo min raxistin; ez li ber sînga xwe teptepandim heya ku razam.

Ez çûm zemanek din:

Dinya bihar bû, zemîn kesk û bi guldar û kulîlkên rengîn xemilandî bû, li her derekê dengê şîrên û xumxuma ava sûlavan, ligel dengê qebîna Kewan û çirîwiriya teyir û tewalan bi taybetî Şalûl û Bilbilan, dihate bihîstin. Ez pêxwas li nava mêrg û gijûgiyayê baxan digeriyam, her weku li Fîrdewsê Adenê an li Baxên Babilê ên hilawîstî. Pirîskên baranê dibariyan û li ser giya û belg û pîlaxên min diteyisîn. Laşê min wek xwe xuya dikir bi taybetî memikên min - mîna du kunêrên biçûk li sînga min derketibûn- piştî ku cilkên reş pê ve hatin nûsandin. Keskesor gihabû lûtkeya ciwaniyê, her hîngê min zanî ku rengê bi tenê nikare ramana ciwaniyê hemûyê bide. Bi nav û dengê wan rengan keskesorê bi min re axaft, got: “Ka destê te!”

Baskên min davezilîn, bi espayî keskesorê ez a matmayî bilind kirim, ji xeyrî tirsek xweş û bawerpêkirî tiştekan din nebû ku ez xwe pê ve bigirim. Li nav zeviyên pembûyê spî û nerm li wê bilindiyê, gulmihemeda dêmê min bişkuvî. Ez bi naz û xezelê xinê bûm: Seqayê tezî derbas bû nava hestên min ên germ, pêlên bayî davên porê min ji kemaxên min revandin û ji xwe re birin, hêla asoyê a dûr/nêzik awirên çavên min ên qerimî li nîva rêkê winda kirin. Ji kêfan de ez hilingivtim û li şûna ku wek Sîmerxekê di tavsorikê de xeware bibim, ez serserkî hatim xwarê. Li xwarê mirovek seyr û biyanî pêrgî min hat, piyên wî ji avê, zikê wî ji axê, serê wî ji bayî û destên wî ji agirî, bi destên xwe –bêyî ku min bişewitîne- ez tazî kirim û paşî bi rengan tafêl kirim. Zikê min livlivî, min zanî ku ez bi rengan avis bûm.

Narînê, hem ji şermê û hem ji tirsê min newêriya benderuhekê pê bihisînim.

Li ser textê Meyrê ê asinî ez veciniqiyam û xew ji çavên min vereviya. Ne Fîrdewsê Adenê, ne Baxên Babilê û ne jî mirovê seyr û biyanî, belê tenê şikeftekan şehdar û Kabira, wî jî doxîna xwe girt û li derî li taq hişt.

\* \* \*

Eynî şevê tayên sar û germ ez girtim, vê carê hindê kes hebûn li hawara min bîn. Rast e zimanê min şikestibû belê hêj çavên min diaxivtin û her tişt digotin. Kesê nedîşiya wê hizirê bipejirîne, lewre jî kesê nedîşiya têbigihe û kesê ku têngihîje qet bawer nake.

Te digot qey ez di kêferata mirinê de me û li benda wan im heya ku gerdena min aza bikin. Meyrê bi guman rûnişt ber serê min û destê min gemirand, Mencilê bi meraq xwe da ser qeraxê textî û henasên min hejmartin, Kabirayî jî wek şahidekê sondxwarî ku rastiyê bibêje, lê qeda lê ketî, li kêlîkên dawiyê, bêdeng ma.

Min nedizanî çawan ez wan têbigihînim bi taybetî Meyrê a hevsoz. Hindek li hêviya mirina min û hindek jî li hêviya vejîna min bûn. Ez jî di navbera mirin û vejînê de, li hêviya dayika xwe Helîmayê bûm, ku bê û ez rastiyê jê re bibêjim. Lê wexta ku hatî û ez hembêz kirim, min hest bi hindek tirsê û şermê kir, min xwest ez biaxivim, tişteki bibêjim, belê zengelora min wek tenûrekê gub bû, êdî min kes li derdora xwe nedît.

Berî hîngê jî min xwîn dîtibû belê tenê xwîna kewalan li spêdên cejnên qurbanê û ahengên sunetkirina zarokan, hîngê ez zivêr dibûm, nediêşiyam.

Meyrê wiha zanî ku ez bênimêj im, hewl da min piştrast bike. Min jî ji aliyê xwe, hewl da behsê xewnê bo bikim, belê ji ber Mencol a guhbel min dera xwe nedidît, min nedizanî ku ew pêştir dizane. Ji ber vizkên xwînê û şirikên xwêdana tayên sar û germ, her bîstekê Meyrê kirasê min û balgîf û çarşev diguherand. Min nedihîşt ew pêşîra min bibîne ji ber ku werimîbû û jineke wek wê xwedan ezmûn baş dizane ku bi sedema bênimêjiyê ew der nawerime. Meyrê li ser niyeta xwe bû, bi bêniyazî xwe gihand Mencolê da ku saxbêriya min bike, lê Mencolê delîve bi kar anî û ez radestî kabirayî kirim. Min nedizanî çi mesele ye, lê Mencolê ez têgihandim ku kabirayî teslîm heye û wê bi min ve bixwîne.

Min guman di mesela teslîmê de dikir. Belê kê diwêriya behsa gumanê bike? Gumanê, ne tenê wateyek nerênî çêdikir, lê ji kebayiran dihate hejmartin.

Mencolê, bi lezgînî mesînek ava germ û derşûkek berîhev kirin, her wisa qalibek Sabûna Helebê û xawliyek gulgulî jî. Kabirayî bi mebest li ber çavên Mencolê zend û baqên min şûştin, perixandin û guvaştin, ev car bi xawlîkê zuha kirin. Nizanim çima, lê gava ku min

li navçavên wî dinêrî, pîrhevoka çîvanokên dapîra min li şevên zîvistanê dihate bîra min. Her bêhnekê navê Xwedê û Pêxemberî diîna û ayeta Kursî bi min ve dixwend, devê xwe ê ku wek solînek xetimî, gihande ber guhê min, got: “Eşhedê xwe bide!” Te digot qey ez gawir im û ew ê min misilman bike.

Niha emrê Kabira bûye şêst û heşt sal û hêj kes tu ji tevnê wî nabe der... Car weliyek e ji weliyên Xwedê û car jî sihêrbaz e, bi xwe hezretê Mûsa jî nikare xwe li bayê wî bihilavêje.

- Xuya ye ku ew ne tenê pîs bû, belê kirêt jî bû!”
- Ma tenê kirêt! Rast e ku xulqeta Xwedê ye, lê belê tu teşabetên wek wî tune ne.

Erê can im. Ez nizanim çawan Meyrê a engîze pê razî bûbû. Li destpêkê, min hizir fikir ku ew jî mîna bavê min û gelek zilamên din ji ber germê û xwêdanê serê xwe bi gûzanê diteraşe, belê piştî ku dersoka xwe diavêt, derket keçel, ne hema keçel belê keçelê kose. Dema ku rûdinişt xwarê, berkura wî wek a eloşîşê nêr şor dibû. Zikê wî wek meşkê di navbera çep û rastê wî de dihejiya. Tu dizanî, wî ne tenê dikarî nivişt û bazbendan vehûne, lê dikarî hindêk karên din jî bike, wek: Pêlavan bireqisîne, rengê avê sor bike, perdaxên şûşeyê bi awirên çavan bişikîne.

Li destpêkê, min jî wek xelkê cîranan bawer fikir, lê paşî min zanî ku têkilkirina Bîkarbona Sodyayê bi şîrê spî re rengê xwînê digire. Şikandina perdaxan jî dibe ku bi hêza nêrînî ve girêdayî be û dibe jî ne wisa be. Lê di der barê pêlavan de, ez dibêjim ne hinêrek e, ji ber ku li van herêman tune maye û nehatiye reqisandin.

Sala Bîst Û Yekê

Min baweriyek mukim bi demê diîna û ez omêdewar bûm ku çareseriyekê ji bo min bibîne ji ber ku em her du zindî ne û dikarin ji hevdu fam bikin.

- Tu û dem?

- Erê. Ez û dem.

Belê mixabin, ew jî bû nêrek û milê xwe da ê Kabirayî û Zarê Mezin. Bi pirsyaran, min temenê xwe dirêjtir fikir. Li Rojhilata bêroj çend Zarên Mezin û çend ên biçûk hene? Çend Meryema hene? Çend Kabira hene?

Sala bîst û yekê be -wek ku wî gotî- ew ê Zarê Mezin ji nav min teriqîne belê kî dikare wî bi xwe biteriqîne piştî ku keçîniya min bi mûma sor daxistî? Kabirayî ez ne bêperdeya keçîniyê bi tenê hêlam, belê tu tiştê ciwan di cîhana min de xewn, meraq, nav, dîrok, reftar û ramanên civaka min, hemû bi carekê şikandin. Xelkê taxê hizir fikir ku Kabira kesekî bawermend e, teqiyê Xwedê ye, lê rastî -rastiya asan- ne wisa ye. Dibe ku heya radeyekê kiryarên mirovî, mirovî bidin naskirin. Lê ji bilî kiryaran gelek tiştên din jî hene ku mirov pê bê naskirin.

- Wek çî Meryema?

- Wek rengên cilan, cureyên xwarin û vexwarinê, derazînka xanî, rabûn û rûniştina li nav civatan, berêxwedan bo kesê beranber. Her wisa pirsyar jî. Cureyê pirsyarên mirovî kefil in ku mirovî bidin naskirin û...

- Tişteke din maye?

- Erê.

- Ez meraq dikim!

- Pêkenok jî.

- Rast e.



- Ew ji ên din tevan girîngtir in.

Bi her halî... Li bal me mirov behra bêtir bi kiryarên xwe tê naskirin belê tevî wê, piraniya xelkê nikarî Kabirayî nas bike ji ber ku kiryarên wî di tariyê de bûn.

- Ango, xelk kiryarên Kabirayî li mizgeftê tenê dibînin, tu kes kiryarên wî ên li bengelê û dikanê nabîne?

- Mexseda min jî her ew e Narîn.

Hindek caran ez li ber dilkokê xwe didim, qîma xwe tînim, dibêjim ku hêj kesên dilsoj li vî welatî mane, heger pê bihisin helbet bo wî nahêlin ji ber ku her tim dibêjin pirsam namûs û xwînê kevn dibe, lê ji bîr nabe. Belê paşî ez vediciniqiyam û min ji xwe re got: "Nexêr! Deng neke, Ew ê te şermezar bikin."

- Dibe. Ji ber ku dûr nîn e her dilsojek Kabirayekî felîte di nav xwe de dihewîne û neçar e ku wî biparêze."

- Rast e. Ez jî ji wê yekê tirsiyam.

Narîn, Kabirayî ez carekê tenê kuştim û hêdî hêdî fêrî jana kuştinê kirim. Belê civak û ew kesên ku xwe bi dilsoj û binamûs nas dikin, bi xemsaî û bêxîretiya xwe, bi tirs û derbirîna bêwate, her roj min dikujin. Kesên wisa, helperest in, tenê li berjewendiyên xwe miqate ne. Ew li her dewr û zemanî hene belê hindek caran ez bawer dikim ku hebûna wan ji encama hindek şaşiyên e di hevkeşên xwezayê de. Bi saya serê feqîr û jaran, ew kes bûne bazirgan, her tim qacikê feqîr û jaran dicûn û nanê xwe bi ava wan dixwin. Ez bi xwe ji wan natirsim çunkî ew bi xwe bêkeramet in, biçûk û bejnokurt in, tenê ziman û kuriya wan dirêj in. Bêhelwest û bêkesatî ne. Qeder û çarenivîsa wan bi hêza desthilatê ve girêdayî ye, desthilat reş be, zer an kesk be, bi xwe bêreng jî be, ne girîng e. Lê a girîng ew e ku bi kêr bê û bi pariyan wan rubîte bike.

- Ango, kî diya wan mehr bike ew dibe bavê wan?
- Enceq wiha ye.

Narîn, bi rastî ez ji wan natirsim. Belê dilê min bi wan dişewite. Û civak jî ev civaka heyî ye, min gemarû dide, barê Kabirayan sivik dike û barê Meryemayan giran dike. Min ji nîva dilî hez dikir û hêj hez dikim, ku Kabira were sizadanê, sizaya tawana wî bi awayek dadperwerane be, ew bi xwe sizayê xwe vebibire. Belê ew kesekî newêrek e lewre nikare xwe dadgeh bike.

- Meryema, ma kî diwêre dawa lêborînê bike ev car heta ku xwe dadgeh bike?

- Ez gumanê dikim ku yek hebe.

Erê, wan Kabira çêkir an Kabirayî ew çêkirin? Tu bersîvê nizanî. Ez jî nizanim. Bi rastî jî ez nizanim ka Kabirayî dadgeh bikim, an perwerdeya wî, an hez û viyanên wî ên sade belê nerewa? Erê, kê rêk da Kabirayî û hemû rêk li ber min girtin? Kê hêz da wî û ez bêhêz hiştim? Kî wî diparêze?

Carinan di xewletgehê de, ez bi xwe re dibêjim: “Pêwîst e ku ez dê û bavê xwe di goristanê de dadgeh bikim, ji ber ku li vî zemanê necis bavê min ez fêrî hezkirinê û lêborînê kirim û dayika min jî bi nazikî û pakî ez firşik kirim.”

Ne ez diwêrim behsê bûyerên tariyê bo tu kesî bikim û ne jî kes diwêre guhdariya min bike. Tu dizanî ji çî ditirsin?

- Ji çî, hey ez heyran?
- Li destpêkê ji xwe ên niha ditirsin û li dawiyê ji xwe ên paşî, ji ber ku ew ên paşî wê ne wek ên niha bin. Ez bûnewereke mê me, barê min giran e, çunkî hemû bi carekê ber bi nêrbûnê diçin... Û perdeya keçîniyê bûye pîvan bo mêbûnê, bûye şert û merc bo keçîniyê

û dehmenpakiyê. Belê heger her kunikek ji laşê keçikê perdeyek pê ve hebûya, tu bibêjî ku seranserî vî welatî keçikek saxlem mabûya?

- Ez li keçikan nagirim Meryema min.

- Ez jî li wan nagirim Narîna min. Keçikên me guneh in. Lê, ez li qewmê zilaman digirim ji ber ku namûsê tenê bi perdeyekê ve girê didin û ew bi xwe diqetînin. Wek ku tu dibînî, di hemû kevalên min de derz û perde hene. Belê hêj kesekî pirsyar nekiriye ka ew derz û perde çî watê didin, ew berê xwe didin astê formî di kevalî de, ne ku astê ruhî.

- Heger bi peyv û rengan têngihîn, nexwe çawan wê têbigihîn?

- Ez nema dizanim. Lê tenê dizanim ku piraniya wan bêdeng û reng in. Derz li her derê hene. Marên kor e li her derê hene. Û kevalên min jî ji derz û maran pir in, belê hêj kes li ser ranewestiyaye. Heger her jinekê derzek di dilê wê de hebe, her zilamekî jî koremarek di nava lîngan de razaye...

- Bigirî Meryema min... Têr bigirî!

- Li min negire Narîn. Ez pêş xwe û te û hemû keçikên vî welatî ve digirîm. Şev û giryan min diwestînin. Şev ne tenê min digirînin belê dihêlin ku ez car car xewnên xweş jî bibînim. Eve bîst û sê sal e ez eynî xewnê dibînim: “Keçkek nazelîn im, ji nû bi ser piyan dikevim. Dê û bavê min gazî min dikin û ez radibim westîkê, belê piyên min li dûv min nayên.”

\* \* \*

Li roja dawiyê ji behiya bavê min- wî çaxî heft roj bûn- ez bi ser xwe ve hatim. Meyrê serê min şûşt û ez gihandim odeya min a wêran, dihate ber çavê min ku malek barkirî ye, ji sîsirk, kimkime û tevnê tevnepîrkan û piniyên şeh û tariyê pir e. Nizanim, ne toza xatirxwestinê bû, ne toza siwarên aşopî bû li ser kevalên min ên

rengdar. Min bêriya odeya xwe kiribû her wek ew heft sal e min nedîtî tevî ku dîwarek di neqeba wê û oda Meyrê de hebû. Heya niha jî hêj wisa ye. Min bêriya Charlie Caplin û Aristophanes jî kiribû, her du bi dîwarî ve hilawîstî bûn, te digot qey ew li benda min bûn. Min hizir fikir ku ê yekê wê bigirî, an bikene, ê duyê jî wê li ber qenterê an ser banî bike hawar û xelkê pê bihisîne. Lê, her du jî bêdeng man dema ku Kabirayî li ber çavên wan ez hetikandim. Bêmirad be, Kabira min û jina xwe Meyrê pê haydar dike ku sultanê cinan, Zarê Mezin, qasidek şandiyê û li hêviya bersîvê ye.

Meyrê guhişî, matmayî li min nihêrî, diviya bibêje derew e, belê dera xwe nedidît. Ji aliyekê ve, ji Kabirayî ditirsiya û ji aliyek din ve dilê wê bi min dişewtî û di navbera her du hestan de bêdengî di destê Kabirayî de bû joker. Hemû ji mezê derxistin, bawer nedikir kingê wê li min bizivire. Çeqmaqa stawbir ji berîka paxila xwe derxist û şemalkek spî vexist berî ku vegerîne cihê wê. Bi agirê wê şemalkê pê ve çû û birek şemalkên din, ên rengîn vexistin, paşî bixûrdank anî û bi bêhna wê henasên min dagirtin. Wek serspiyek a jixwerazî, ez bêstar kirim û dest bi hindêk şîretan kir. Ez li ser qana piştê dirêj kirim, paşî wergerandim ser zikî, bi perdeyeke şîn nixumandim berî ku dest bi sîhkara xwe bike. Çend kurteayet ji Quranê xwendin û şîroveya xwe a taybet bo hindêk dîmenên, ku zirav li mirovî diqetînin, pêk anî her wek: çalên xezlînê, marên dirêj ji dirêjiya darxurman, dûpişkên mezin ji meziniya çêlekan û daleqandina jinan ji memikên wan û... Gelek dîmenên din ên sosretane. Ez nizamim çima qala van dîmenan ji kesên belengaz re dikin!

Te digot qey Kabira ji Cehnimê hatiye û hemûyê dizane. Wisa ez têgihandim ku Cehnim bi tenê heye çunkî qet behsê bihuştê nekir.

Piştta min difirkand û min jî li vê mehfûra Farisî a sor dinêrî, wek yekxterme, bavê min ji Qesra Şîrînê, bi xwe re anîbû. Min li vê mehfûra din jî dinêrî bi taybetî li şûrê duçeçî di dest Îmamê Elî de. Wek helwest, tu cudayî di navbera wî û her du ên din de nebû.

Ji nişka ve, mîna hûreyayî, Kabirayî perdeya şîna avirmîşî ji ser min hilda û got: “Rûne ser kundikan!”

Rûkên min ketin erdê, hestê tirsê û şermê wek serkên sar û germ gihan hevdu, ez neşewitîm belê tezînkê ez girtim. Bi destekê min sînga xwe û bi destê din jî pêşîra xwe veşart. Wek misarekê, ez diavêtim ber lingên xwe û li dor xwe dizivirandim. Bi zimanekî biyanî, ez bawer dikim ku ji bilî wî kes din têngiye, bi dîwaran re axift, her bêhnekê kefa destê xwe datîna ser gulîfanka serê min, bala çengê min kir, destên min hildan û lingên min kirin pirek zirav belê bilind, sînga min da dîwêr û berî ku min li xaç bide, ez gêj bûm û herifiyam ber kalka wî a spî.

- Ê paşî Meryema?
- Paşî bi her du lepên xwe bermayên min vêdan û wek peykerek bêcan ez danîm nîva mezelê, berê xwe da min û destê xwe bi keziya min de anî xwarê.
- Bi rastî keziya te gelek xweşik e, reş û dirêj e!
- Spas! Çavên te xweşik in. Hindî bi bîra min tê keziya min wisa ye, digihe ser kemaxa min. Nizanim çima, belê hêj min du kezî venehûnane.

Bi her hal...

Bi dû re, Kabirayî destê xwe bi piştta min û kemaxên min de anî xwar heta ku giha lingên min. Çû û li pişt min sekinî, vêca destê xwe gihand dev û lêvên min, bersînga min, navika min, mîna dizek şareza dema ku cama dergehî dişikîne û bi jîrî destê xwe digihîne

kilîtê, eha wisa destê xwe gihand mûyên binzikê min û li dawiyê - tenê bo bawerî- ez li hembêzê xwe guvaştim berî ku bibêje: “Ez bi ser hil bûm, cin ketine nav laşê te de. Belê netirse, ez ê wan biteriqînim heger ku sala bîst û yekê be.”

Bêcil û berg min hest bi windabûnê fikir belê wî hez fikir ez winda bimînim, xwe nebînim. Di wan kêlîkan de, ez gazî dayika xwe Helîmayê dikim û ew jî gazî Mencolê dike, têdigihîne ku çareserîya min wê çil rojan dom bike ji ber ku cin gelek in û hewl û helmetek mezin ji bo derxistina wan gerek e. Mencolê dizanî ew çi dibêje, belê min nedizanî. Paşî bi zaravek tijî guman, got: “Sultanê cinan, Zarê Mezin, dibêje bila evda Xwedê, Meryema keça Helîmayê, guhê xwe bide te, newebe dilê te bihêle.”

Pirsyara ku Kabirayî dixwest ji min bibihîse, ji Mencolê bihîst: “Mebesta te çi ye hey Xwedê jê razî?”

Pêşwext wî bersîv hebû: “Ne mebesta min e, belê a Zarê Sultan e. Ew dibêje lazim e mirovek niyas biçê di nava kelexê Meryema keça Helîmayê de, da ku bikaribe cinan bitirsîne, belê bi şert ku ew mirov weliyek ji weliyên Xwedê be û navekî axretî li ser be!”

- Tu kesê ku Kabirayî bibîne wê hizir bike ku xişîm e!

- Erê Narîn.

Dîmen dikarin bînahiyê bixapînin. Sêzdeh sal kêr bûn ku mirov rastiyeke aşkera bike, lê bîst û sê sal jî gelek in heya ku mirov wê rastiyeke ji bîra bike.

Dariçîn

Çil rojan... Her roj li gor fermana Kabirayî, min destnimêj digirt û çarşefek spî li bejna xwe a esmer dialand, te digot qey ez li Meke û Medîneyê me, li tewafa berê beytê. Li destpêkê ez dudil dibûm ji

ber ku heyamek di ser qewlê min re bihurî û min xwîn nedît, belê paşî ez bisteh bûm ji ber ku malmîratî henase û kunikên laşê min ji bêhna bixûrê dagirtin. Zemînê min ê berdelanî û tî li benda barana hezên bênefs dişehtî, lewre bêhemdî xwe, min dixwest dem bo demê ew av bide. Tu bawer dikî Narîn, di wê taristanê de, şemalkên Kabirayî bûbûn roj û mûyên laşê min bûbûn gulberroj?

- Ez bawer dikim û têdigihim jî. Tenê hez û xwersk jinê lawaz dikan.

- Erê. Tenê ew dikarin hêzekê bidin zilaman.

Ezmûnek xwezayî bû. Ne taybet, belê cuda bû, ji ber ku li dawiyê meraqên har û agirînî keçîniya min fêrî xiyanetê kirin.

\* \* \*

Xwîna serê mehê ji min qut bû, min zanî ez avis bûm, ev car ne bi rengên keskesorê û ne bi destlêdana zilamê seyr û biyanî, belê bi gûrha binê Kabirayî.

Heyamek çû û heyamek din hat û nîşanên avisbûnê li serûberê min xuya bûn. Meha min li darçînê ket û ji bedbextiya min, darçîn tenê li dikana wî peyde dibû. Ew dikan li ber xelkê taxê bûbû qeyserî. Pêdawîstên keç û jinan tenê li wir peyde dibûn. Cixare çî ye, bi xwe cixareyek jî tê de nebû tevî ku jina wî Meyrê digot ku ew cixareya destpêkê tenê bi şixartê hil dike.

- Pêşwext bikirên xwe destnîşan dikirin!

- Lebê û bi hostayî.

Li hersê mehên havînê -bêhnvedana sala xwendinê- zikê min bûbû sê mehî, ji kesî nedihat veşartin bi taybetî ji jinên şûkirî. Ez matil mam, min nizanî xweliya kê bi serê xwe werkim. Heta radeyekê ez çilek bûbûm, li her danî xwarin û vexwarina min bûbû ducarkî. Mencilê her dem hewl dida min birçî û tî bihêle. Şevên min wek şevên Yelda bûn. Hêj tarîgewr, wek xidamekê min xwe li ber

derazînkâ Mencolê diqurîsand heta ku hişyar be û bihayê darçînî bide min. Bezê dilê min diheland, pêlava wê bûbû berdemora serê min ê ku qet sucde ji bo tu kesî nebirî. Min xwe diavêt pişt landika Kovanê bira û ez digiriyam û digiriyam, bi hêviya ku dilê wê bi min bişewite. Keziya wê kurt be, heya ku riyalek dida min, ruhê min derdixist. Li dawiyê, bi min re dihat heta ber deriyê dikanê û bi rûqayimî digote Kabirayê jinperest: “Ka bi saya serê xwe hindêk darçîna xwe bide vê cengenê û hindêkê ji bo min jî bişîne!”

Paşî ez ê bizanibim ku darçîn bo min tenê mebest bû, belê bo wê behane bû.

Her carê, bi hinceta darçînê Kabirayî tolazek li kolanê radiwestand, bi pistepist pê re diaxivt û destê xwe digihand berîkê berî ku li dû Mencolê bişîne malê. Carekê di navbera xwe û min de bi lixêzî got: “Mencol bûjin e, belê ne pûla ye.” Hîngê ez mexseda wî tînedigiham.

- Kabirayek pêzeveng jî bû?
- Nexwe?

Belê pezê biyanî li kûzên xwe nediçerand. Bêxêrî, di neqeba çav û abrûyan de, xebengê dikankê anî xwarê berî ku bûyerên tariyê dest pê bikin... Wek çekçekîlekê xwîna min dimijand. Min li kaboka darçînî dinihêrî, min agah ji tiştêk din nebû. Narîn can, wê hizirê bike tama darçînî jan hemû ji bîra min dibir. Belê kê m darçîn dida min ji bo ku dîsa qesta şikefta wî bikim. Dem bo demê min diviya xwe qayîm bikim û nehêlim ku ew dest li min bide, belê wek gustîla zîvîn li tiliya xwe, bi kêfa xwe ez dizivirandim. Bêmirwetî...

- Berdewam be Meryema min... Min girtî kevalek e û tu nîgar dikî!



- Ez şerm dikim dema ku behsê wan bûyeran dikim. Belê ji te venaşêrim, ez hest bi hindêk rehetiyê dikim ji ber ku nêzikî rastiyê dibim.

- Hemû deman bi dest mirovî nakeve ku nêzik rastiyê bibe. Berdewam be!

Bêmirwetî, ez çargavî ajotim, telîsê xetsor li nîva dikankê raxist û wek her carê, piştî hindêk zikrî û selewatan, tif dikir bin zimanê min û digot: “Eşhedê bide û xwe ji bo Zarê Mezin bitewîne.” Min serê xwe datanî erdê lê kemaxên min bilind dibûn. Ew li pişt min disekinî û wek bagurdanî destê xwe li ser piştê min digeland heta ku zik û sînga min ji zemînê dikanê digirtin, hestiyê piştê min diêşand. Bi pencên xwe kemaxên min diguvaştin û paşî dadivezilandin. Niza ji bo çî her gavekî destê xwe digihand kaboka vezelînê. Min qîjîyek veda berî ku doxîna wî wek marekê li nav lingên min biteze. Min tîna berçavên xwe ku lawek ji lawên vî bajarî ye, belê wexta ez li xwe dizivirîm mar û zîlka wî dihatin berçavên min.

Carên pêştir li ser qana piştê, hindêkê li min xweş dihat ji ber ku hestê mêyatiyê di min de dilivand, belê li ser çokan hêstîrayê ez digirtim û hestê min dimirand. Bêmiradî, ez di ber mirinê re dibirim tenê da ku di ber tayê re bêm. Nizanim çima, hestek xerîb li bal min peyde bû, ku ne mirovek e seksî bi min re dike, belê heywanek e. Her carê ez westiyayî û kerixî dizivirîm malê, belê tolaz rehet û rûken dizivirî serê kolanê.

\* \* \*

Dewletserê darçînê, mehek sax bûyerên tariyê xwe dubare dikirin mîna şano ên Misrî. Belê piştî hîngê, meha min xwe li kêmê da, her wisa çûna min jî bo dikanê, an baştir e bibêjim bo şikeftê. Ji hîngê de hemû dikan li ber çavên min bûne şikeft û xwedanên wan jî bûne Kabira.

Hedara Kabirayî nehat, lewre xwest li odeya min berdewamiyê bi serketinên xwe ên dîrokî bide. Belê ji ber jina xwe Meyrê nediwêriya, çinku min xwe diavêt ber bextê wê ku min biparêze bêyî ku navê darçînê û Zarê Mezin bînim.

Meyrê ji Mencolê bi guman bû. Gotinên xelkê di der barê Kabirayê xwe de dibihîst û reftarên Mencolê jî bi çavên xwe didît, lewre ligel rojgarê gumanê pirs û tirs peyde kirin, ev car Mencol ji min ditirsiya. Wê dizanî jî ku min serê Kabirayê wê navê û axaftina wî bi mirina min e, belê ji ber ku jin e, nedikarî xwe li ber xîretê ragire.

- Pirsyarekê Meryema min. Dibêjin, heger zilamek bi jinê re raza, êdî tu car ji bîra wê naçe. Li ku be û kingê be, dema çav pê dikeve, demlidest ew tê bîra wê û jê xerîb dibe. Ma qey rast e?

- Min ji wî hez nekiribû da ku bersîvê bizanim.

Na. Min ji wî hez nekiriye. Ewî xwe li ser min ferz kir û bû rastiyeke jandar. Carekê tenê jî min hest nekir ku ez bi zilamekî re radizim. Çend sal bihurîn jî belê hêj bela xwe ji min venake. Geh wek xewekê, geh jî wek şevpestekê pêrigî min tê û min gemarû dide. Ez pê diêşim, bêhna min malix dibe, xwêdan bi min digire. Ne tenê cara yekê ez pê aciz bûm belê her car, ji ber ku tiştê wisa di serê min de nebû, li ser difina min çêdibû. Heger carekê tenê jî ez bi dilê xwe bi wî re ketibama nava nivînan, belkî hîngê min mîhderivanî jê re bikira. Ka ez jî pirsyarekê ji te bikim Narînê!

- Kerem bike Meryemayê!

- Gelo ma Kabirayî dikarîbû wiha bike ku rojekê ji rojan ez wî aza bikim û jê hez bikim?

- Carekê min di nivîsarekê de xwendibû, ku hezkirin tê çêkirin. Mînak... Heger heyamekê pisîkek an masiyek bi mirovî re bijî, hîngê mirov dikare jê hez bike.

- Dibe. Belê eve ne pisîk û ne jî masî ye. Ev Kabira ye.

Semyan – We ma edrake ma Semyan?

Narîn: Ez hez dikim bawer bikim ku ev welate hêj welatê min e û ev gel jî hêj gelê min e, belê ligel nebûna bersîvan pirsyarên min kûvî dibin, bi serê xwe dikevin û sînorên hez û baweriyê dibezînin.

Ev welat e jî ji keçîniyê hatiye xistin belê hêj em şanaziyê pê dibin ku welatê me ye. Ma tu ferq di navbera welat û keçê de heye?

Li tengasiyan, welat welatê me bû, gel jî gelê me bû. Belê li berfirehiyê, hindêk xwedanên nû jê re peyde bûn û em derketin ên biyanî. Biyanîbûn bo hindêk kesan dibe welat, belê welat ji bo me dibe biyanîbûn.

- Em hemû bûne biyanî.

- Erê. Em hemû bûne biyanî. Tu li welatek Îskandinavî, lê ez li welatê xwe ê ku her tim li ser digiriyam. Te rastî bivêt, ji mêj de em bûne biyanî, madem ku “Dar el axîre dar el beqae” em biyanî hatin û biyanî wê bar kin. Bawer bike ên din jî biyanî ne, lê nizanin. Rast e ku hevdu dibînin, dibihîsin û diguncînin ji ber ku gewd û sîmayên wan ne biyanî ne, belê ruhên wan? Ax Narîn... Li vî welatî, kî maye û hest bi havîbûna ruhî nekiriye?

Eve ne pirsyarek e ez ji te dikim, ne jî bersîvek e ez amade dikim, lê belê tenê bixwegotinek e di kêlîkên xelwetgeha şevînî de. Pirsyarên me tazî û serberdayi ne, li ser qeraxên sînorên qedexe bi xwe re peyasê dikin tevî ku li van welatên ku, ji bilî azadiyê wekî din bo her tiştî berhev in, ne tenê zarok û bêkar zehf in, lê bersîv jî.

- Kî pirsyaran çêdike û kî bersîvan dide?

- Çend tu pirsyarekê bikî ez bêtir gumanê di bersîvan de dikim. Kî bersîvan bide, gava ku bêhna sirgûnê henasegeha min tijî dike, perdeya tenhistanê diqetîne, derdeseriya demsalên bêdaw

digihîne radeyê bînahiya du çavên qerimî, asoya derûnê vedimirîne û agirê dogehê tê de hil dike? Hîngê, evîna mezin li bîra min dimîne û gunehên biçûk li bîra wan dimînin. Erê çima evîn gunehan naxefirîne?

Kî bersîvan bide, gava ku hestê azirî lavja xeybê distirîne, û pîrên tarawgehê ji awatên şikestî darbestên xwe çêdikin û bi cotê keziyên bêriya welatî dixemilînin û bi dengê mandî bi mirina xwe dibêjin? Hîngê, Avamezin bêpêl dimîne, masî li ser avê dinivin û kevz mîna biskên Mencolê -li dema telqînê- vediçere û kêlîka zuhabûnê bo tîna min a sermedî radigihîne. Hîngê, hêla berzexê dibînim, lê çima aliyê zelal û şîrîn nîn e?

Kî bersîvan bide, gava ku aşên bayê bêmiradiyê Donkîşotê jar li hembêza min digirînin û Rembrantê lasar bi dîwarên perestgehan ve dadileqînin? Hîngê, yeman hemûyê ji bîra min dibe, tenê henasa candanê bi bîra min tîne, dergehê holîkostek nû vedibe, bejna dûkêlê bi ser a min dikeve, nalîna min ji vedengê azadiya bêtûte û temenê gendeliya rayedarên bêmirwet derbas dibe. Ji xerî mistek xweliyê û meraqa dîtina bêdewletiya kurê hêj nebûyi, tu ji ber min ve dimîne?

Ez a evîndar, evîna zîndînbûnê di deryaya gumanê de dimeyînim. Ez a lexirîn bi hebkên “Cypro – Apetti” yasayên birçîbûnê dibezînim. Ez a çavtirsandî, bi bazbendan dêwê tirsê -dema li kozên valatiya keçîniya min diçere- diteriqînim û efsaneyê Zarê Mezin di serê xwe de diteqînim û di êsirên qoçaliyan de, li ber dergehên mizgeftan, her tiştê pîroz birîndar dibînim. Hîngê, jiyana bêmeraqa û mirina rezîl muzayedê li ser min dikin, destê xwe dikin destên hevdu. Belê, kî destê xwe bike di destê min de?

Narîn, ez nizanim çima, lê dema ku çavên min dixurin “Odîb” tê bîra min!

- Ez nizanim çi bêjim Meryema min!

- Ez jî nizanim.

Û nizanim jî kî bersîvan bide, gava ku li şûna baranê, toza hespê “Troya” li serê milan dibare û li şev nîvên şevan tirs û bêdariya min ayetên pirtûkên tijî xitm û şîfre, ji toza gumanê dadîqutine berî ku bi elîfbêtkek biyanî ji bo min bixwînin? Û rûbarek ê sor ji pozê min diherike û dawî dilopa xwêdanê li ser pîstê min ê esmer û alûs diqerise û hest li ber derazînkê dilê min dicemise û kelexê min wek paporê “Hezretê Nuh” li benda tofanê dimîne. Û dawî nêzik dibe, çirayê şevistana Meryemayê vedimire. Hîngê, ne êdî kesî dibîne û ne êdî tu kes wê dibîne. Nexwe, mirov te ji du çavan bike? Hîngê dîsan gumanê dikim: erê Meryema ez im an ez Meryema me?

Kî bersîvan bide, gava ku li biharê, kovanên min kate didin, li payizê xweşiyên min li bêderên keçîniyê ber ba dibin? Mîna darçinarek bêpel, takên min bo bayê hesretan xwe ditewînin, dehmena min ji belgan tijî dibe, tazî dibim û tîrêjên elinda Kabirayek felîte xezelê bi şeh û xwêdana bedena min dikin. Hîngê, demlidest “Jaro Heyran” tê bîra min, dîsan dibêjim... Xwezî ji xêra Xwedê û mîrê Miradan re, min henasa xwe a zuha ji bêhna xwêdana bedena te dagirtana, lê eniya min dibe sêva “Neyotin” û lepê min jî dibe zemîn. Hîngê, hemû ji kenan re dimirin û ez ji mirinê dikenim.

Kî bersîvan bide, gava ku bipîve sîtavka min dipîve, pêlên bayî her du çengên min dişikînin? Hîngê, dîsan firîn qedexe ye, fîxan zemawend e. Rastî, car xwe li bin danga min vedişêre car jî kirasê min diçirîne û ji her derê gilêz diherike.

Kî bersîvan bide, gava ku ez di xelwetgehê de kirasê miriyan li kevalên xwe dikim, û sînga min bo kul û meraqan dibe senderîk? Hîngê, bêdeng î ziman e, rawestiyan zeman e. Ji nû dizanim ku perdeya keçîniyê tu qîmet nîn e. Û vedengek ji dûr tê “ لا يحمل الله نفسا الا وسعها ” hîngê, kêfa min bo min tê û şanaziyê bi nefsa xwe dibim.

\* \* \*

Ez ne mihtac im mirina kesekî rabighînim, na. Berî Niha min gote te: “Di navbera mirin û vejînê de, ez li hêviya dayika xwe Helîmayê me, da ku rastiye jê re bibêjim...” Ez dikarim mirina xwe tenê rabighînim, belê hêj zû ye ji bo mirina min. Min biryar da ku êdî ez nemirim.

Gelek caran, gelek kes dibêjin ku mirina Xwedê ji wan kême e, lê ez wiha nabêjim ji ber ku ne mirina Xwedê, belê ew bi xwe ji min kême e. Ji nava hizira xwe a direhî, ez petîkên “Rehman” û “Rehîm” vedidim û peykerekê jê çêdikim, tenê ji bo ku bibe rastiye û di bîra min de bimîne, an hestên min ên havî hindekê rehet bike belê “Cebare” û “Mitekebir” çavbaran nagirin, nahêlin.

Narîne, çêdibe ku cihê bêtir ji zilamekê di dilê jinê de hebe, belê cihê du xwedawendan di serê wê de nîn e. Ez jin im û dizanim çî dibêjim.

- Wexta ku belg bê emrê wî ji darê nekeve, nexwe çawa bê emrê wî kamira bi saxî tu veşartî?

- Şev dirêj e û tu jî dem bo demê gûzên xwe li ser dilê min bişikêne. Pirsyarên xwe bike, ne xerab e. Belê li benda bersîvan nemîne. Ez nikarim bersîva te bidim ji ber ku heta vê kêlîkê ez bi xwe pirsyarek bêbersîv im.

Dibe ku kesekî ez afirandibim, lê li derveyi memleketa xwe, belê min gelek kes afirandin û di nava memleketa xwe de. Û wiha, li derveyî wê memleketê rojane ez tîm çewisandin, mafên min tîm

pêşêlkirin, belê ew di nava memleketa min de ciwan û nimûdar in, her dem hene ji ber ku zindî ne.

- Wekî kê?

- Wekî gelek kesan, bo nimûne: Bavê min, dayika min, cegera min “Semyan” û...

- Û kî din?

- Ez nizanim Narînê. Belê hest dikim ku hindek kesên din hene bêyî ku ez wan nas bikim, an ew min nas bikin. Ez bawer dikim, ku hêviyên min sade û rewa ne, ne estem in. Ez darê Mûsayî naxwazim da ku deryayên xeman pê derbas bikim û gil û gazindên xwe bigihînim xêrxwazan.

- Ma kî dibêje ku xêrxwaz mane?

- Tu kesê ne gunehkar be, ew xêrxwaz e. Belê tu bêjî kesek maye û nebûye gunehkar? Eve ez, ez jî gunehkar im.

- Na. Tu ne gunehkar î, belkî gunehbar î. Tu ne keça gunehê yî, navê dayika te Helîma ye û navê bavê te Dêwalî ye. Mineta kesekî hilnegire. Tu Meryema yî... Mêyek, belê li zemanek nêr. Evîndarek dilbikul î û keştiya evîna te ber bi kinarên dayikîniyê diçû.

- Dibe rast be. Evîndareke dilbikul im û keştiya min ber bi kenarên dayikîniyê diçû, lê berî ku bigihe, rawestiya û binav bû.

- Binav bû, belê pêlên zîndînbûnê bi hawara te de hatin.

- Înkar nakim.

\* \* \*

Wek niha, hemûyan berê xwe ji min wergerandin, bi xwe kita mayî jî ji xêrxwazan. Li welatê min berê min dane xerîbiyê. Sînor bi sînor, bajar bi bajar, ez li mistek axa azad, li pirtek nasnamê, li maçek bêguneh geriyam, belê heyhat. Min Mirad bû, carekê zilamek eniya min, an çavê min, maçî bike û biselmîne ku hêj maçên bêguneh hene. Tu dizanî li wê heyamê ez ji çî ditirsyam?

- Ji zilaman?
- Te dît, bi xwe bersîva te jî pirsyar e!

Nexêr, li wê heyamê şerê kendavê yekê hêvênê zilaman nehiştibû, ê kuştî kuştî, ê birîndar birîndar û ê bêseruşûn jî tenê hêviyeke biçûk û bendemaneke dijwar li pey xwe hêla. Tovê wan birhabû, kita mayî jî nesax bûbû, bûbû êl û eza û ket ber bext û barê jina xwe.

Zilam nemabûn ku ez ji wan bitirsim. Belê ez a avis ditirsyam, ku rojek bê û pariyek nanî bi dest min nekeve, paşî bibim dêhleba û gezan deynim. Heta niha jî dema ku çavê min bi pariyê nanî dikeve, hest bi birs û tirsek ecêb dikim. Rast e ku yek bi 'bi'yê dest pê dike û a din bi 'ti'yê, lê her du jî dikarin tiştan bi dawî bînin bêyî ku ew bi xwe bi dawî bînin. Pêwîst bû ku ez ji pariyê nanî û hestên azirî rizgar bibim, azad bibim û bo azadiya xwe bistirînim, lewre jî min kevalên jiyane nîgar kirin. Xuya ye ku ez ne ji xwe fêrî stran, nîgarkêşî û azadiyê bûme. Ez dikarim Xwedayê hinde mezin di stranekê de, di kevalekê de, di azadiyê de, bibînim an winda bikim. Berê bavê min û niha jî Xwedê. Berê ez piçekî ji bavê xwe ditirsyam ew jî Mencol sebeb bû. Belê wekî din, min ew xweş diviya. Niha, ez piçekê ji Xwedê jî ditirsim -ne tenê Mencol, lê hemû sebeb in- belê min ew jî xweş divê ji ber ku dibêjin ew pak, bexşende û mîhredar e, ango wek bavê min e. Min bavê xwe dît belê hêj min Xwedê nedîtiye. Heger hebe wê xwe nîşa min bide. Lê wexta xwe nîşa min da ez ê çawan wî nas bikim?

Hebûn û nebûna tiştî li nik min ne girîng e, lê çawaniya wî girîng e. Ma kî bawer dike ku tirs min têra bajarekî heye? An xweşviyana min, têra hemû kîndaran heye? Mesele ne bawerî ye, lê ez hest dikim ku yek Xwedê heye û hindêk daran dixwazim di mîhraba wî de gunehên xwe aşkera bikim, xwe a qurban bibînim, belê...



- Belê çî...?

- Belê çima heta niha ez a mandî min a winda nabîne? Ax Narînê, ji şevê dî were ez negiriyame.

Ka çawan li firehiyan Xwedê dergehê min dikuta, eha wisa bila li tengasiyan jî, li serê spêdeyeke bêdeng, an êvareke dereng, gumlekê bavê min, an jî spîkirasê dayika min li xwe bike û serê min deyne ser milê xwe, an ser çoka xwe û biteptepîne. Ji xeyrî dê û babê min, qerê tu kes din li ser min nîn e. Heger ne ji bo xatirê min be, bila ji bo xatirê Semyanê min be.

Ji bilî Xwedê û Semyanê min kesekî din nemaye û her du jî hêj nehatine... Tu çî dibêjî, ez li hêviya hatina wan bimînîm?

- Ku te tu karên din nebin, bimîne!

- Kar bi dawî nayê.

\* \* \*

Di çiriya yekê, sala 1983'an de, dîsan sawa guherînên fîzyolojî ez girtim, ez damirkand im. Ez bêqam zivêr û bêzar bûbûm, ji her tiştî û her kesî ditirsiyam tenê ji xwe na, ji ber ku min hest dikir ez ne vala me, di kûratiyên min de jiyaneke nû dest pê dike. Zikê min giran bûbû, te digot qey çiyayek e tê de. Vêca, madem ku ez ji xwe natirsim bila kes ji min netirse. Ma ne weye Narîn?

- Tu dizanî Meryema.

- Dibe, lê zanîn ne bes e.

Li heyama destpêkê, serê min gêj dibû, ez gêj dibûm, min vedirijant. Wê hizirê bike, êdî min nedikarî bi Meyrê re li ber derazînkê rûnim. Tevî ku min dev ji xwendîgehê berdabû jî, lê bi hinceta xwendinê, min xwe dûrî çavan digirt, belê roja min dirêj dibû, ji bîst û çar saetan dirêjtir.

Piştî ku ez li kilasa heftê bi ser ketim, bi coş û meraq min viya xwe bo kilasa duyê amade bikim, belê wisa çênebû. Hemû kul diçin tenê kula xwendinê ma û roj bo rojê mezintir dibe.

Li vî welatî, ne tenê tiştên mezin biçûk dibin, belê hindêk caran tiştên biçûk jî mezin dibin.

Serê zîvistanê bû, wek ewran ez jî nîv vala û nîv dagirtî bûm, gelek lawaz bûbûm, zirav bûbûm belê nediqetiyam. Wek simbêlên kirîvên cixarekêş, madê min zer bûbû. Paşê min hizirand û bi xwe re biryar da ku xwe rabigirim û ji bo Semyanê xwe ê dûr- nêzik bijîm.

Ji xeyrî Semyanî, sebra min bi tu kes din nedihat. Ew bûbû Semyanê ruhê min, ji ber hindê min dixwest navê wî bikim “Semyan.” Semyan bûbû xewna demên dawiyê, bûbû sînahiya dawiya tunêlê. Min li ber bû her tiştê xwe bi wî re hevpar bikim... Dema xwe, şev û roja xwe, girî û gîrnijîna xwe, bi hêviya ku salên xem û aloziya min qerebo bike û bo xweşî, an nexweşiyên, xwe amade bike. Min hez dikir Semyan ne tenê bi sîma û dîmen, belê bi rewşt û reftar jî bide bi bavê min Dêwalî an dayika min Helîmayê ve, ne bi Kabirayê felîte ve.

- Meryema, xuya ku ye tiştek hevbeş di wênên hersêkan de heye?

- Erê heye, mirin e.

Û ez çilek bûbûm, min nanê xwe ji keda bavê xwe didizî. Şev nîvên şevan wek pisîkan ez li nav qirûqafan digeriyam bi hêviya ku pariyek nanî bibînim û leşkerê birçîbûnê li pişt tixûbên xwe mijûl bikim bi kêmî heta ku roj derkeve, belê berî derkeve ava dibû.

Narîn, mirin bûbû daxwaza herî mezin ji bo min, belê wek zarokekê, dema nivîstî û vediciniqe, eha wisa ez vediciniqîm û min ji xwe re digot: “Heger ez mirim, ez ê ji bo xwe bimirim, belê gerek e ez bijîm

ji ber ku ez ê ji bo Semyanê xwe bijîm.” Dinya vala bûbû. Mirin, jiyana, Semyan û ez bi tenê mabûn ser rûyê vî zemînê. Min xwe bi danga jiyana ve girt, min nedixwest ew min bihêle, lê Semyanê min sehwa bûye; xwe bi danga mirinê ve girt.

Ka ji min re bibêje: Ez çî li vê mirinê hemûyê bikim?

Yê Din

Tu bawer dikî ku kes hindî min nemiriyê, her çendî kes hindî min ji vê jiyana hez nake jî? Te jiyana min dît, belê hêj te mirina min nedîtiye. Ez baş dizanim ka ez ne ji bo çî dijîm, belê nizanîm ka ji bo çî dijîm.

Bibihure Narîna min. Tehemûla min bike ji ber ku min kes din nîn e da guhdariya min bike, an ji min fam bike. Jiyana sar û tarî ye û kaxizên min jî têra xwe hene ku bişewitînim, belê ez kaxizên xwe bo her kesekî naşewitînim.

Di vê kêlîka berhest de ji vî temenê ku bi trajediya xwe dirêj û bi xweşiya xwe kurt, ez dixwazim pirsyarekê ji te bikim...

- Kerem bike!

- Erê tu çawan min dibînî, wek keç an wek jin?

Dibe ku ne pêwîst be, belê ez hez dikim alîkariya te di bersîvdanê de bikim. Berî niha, di navbera her duyan de min hêvî dikir bibim dayik, lê xuya ye ku daxwaza min gunehê an mafê ne rewa bû. Xuya ye jî ku çênabe kesên bêxwedan gelekî bixwazin, lewre ji hîngê de ez bi kêmiyê razî dibim belê di eynî demê de xwe kêr nakim ji ber ku derzên ruhê min têra dîwarên hemû zîndanên Rojhilatê hene.

Û niha jî, ez dixwazim bibim tiştek, tenê tiştek, belê tiştek nû.

- Hemû keç dikarin wekî xwe bimînn, ango keç bimînin, an bibin jin, lê di navbera her duyan de, te karî bibî tiştekî taybet.

- Tiştêkî taybet, an cuda?
- Taybet an cuda, ne girîng e, girîng ew e ku tu wek xwe bî û ne wek kes din. Bibihure bo bistehiya min, belê bizane ku jiyana wan tev bêperde ye. Perde li her derê qetandî ne. Çav, guh, pêşîr û odên nivistinên wan bi carekê bêperde ne, lê a te perdeyek tenê hatiye qetandin, ew jî ne te, belê nûnerê wan qetand. Meryema min, xwe nas bike û tu car wê rastiyê ji bîr neke!
- Tu dizanî ku gelek seyr e?
- Xwenaskirin seyr e?
- Na. Xwenaskirin ne seyr e, ew mustehîl e. Lê mexseda min jibîrkirin e. Min gelek tişt ji bîr kirin, belê hêj gelek tiştên din li bîra min mane wek mirin, mar, derz, Zarê Mezin û...
- Berdewam be!
- Ê "Kirmanc."
- Kirmanc kî ye?
- Bêhna xwe fireh bike, ez ê behsa wî jî bo te bikim belê li dawiyê. Wênegirek ecêb bû. Xwezî her tişt bi kameraya wî bihata dîtin bi taybetî rastî. Ax Narîn! Em çend mihtacî kamerayê ne, belê em nizanin. Piştî sî û şeş salan û her salek bi sî û şeş salên wan, ew li hawara min hat belê dîsan xeware bû. Piştî tu Kirmancî nas bikî, tu yê bêtir ji min fam bikî.

\* \* \*

Nara min, heger mirov di xwe negihîje, wê çawan xwe nas bike? Heger xwe nas neke, wê çawan xewn û xwezîkên xwe nas bike? Çawan wê xeyrî xwe nas bike? Çawan ez xwe nas bikim û her yek bi navekî gazî min dike, bi awakê serederiyê bi min re dike, bi zimanekî bi min re dide û distîne, bi gunehekê min dadgeh dike?

Mixabin. Ne pêşmerge xwedanê birnoyê ez a kurdperwer nas kirim, ne gawirê xwedanê pêkê şerabê ez a mulhîd nas kirim, ne jî melayê

xwedanê tizbiyan ez a bawerdar nas kirim. Tenê Kirmancî heta radeyekê ez nas kirim. Belê ji ber ku wî ez weku mirov û aşiq nas kirim, lewre polîsên Xwedê û dewletê ew teriqandin.

Tu dizanî kingê ez xwe nas dikim? Ez ê ji te re bibêjim: bi kêlîka demê re, dizanim ku ez kî me û çi me, ango xwe nas dikim. Kêlîkek dem dikare mirovî rawestîne da ku li xwe mukir bê û mahiyet û bûneweriya xwe nas bike. Belê li derveyi kêlîka demê, mafê me heye em pirsyarekê bikin: Em kî ne û çi ne?

Min bi awayek berdewam helbest û felsefe her du dixwendin, belê xwendina helbest û felsefê bersîvên pêşwext amade, napejirîne. Trajediya min û her keçek, an jinek din li vî welatî, bi xwendina helbest û felsefê bi dawî nayê, lê belkî mezintir û kûrtir dibe. Em hemû bêçar in ji ber ku hêj me nikariye asta trajediya xwe nas bikin. Mafê me hemûyan heye ku em pirsyaran bikin û dangehên bendemanê vala bihêlin madem ku serên riyan li me winda bûne. Erê trajediya kê bi qasî a me ye? Kê mîna me derdeserî û xwelîserî dîtiye? Kê bi qasî me temen li wan îstgehan bihurandiye? Belê, kî wek me zû ji bîr dike?

Êdî em nikarin bêsînor bijîn, lewre jî em zatê xwe sînordar dikin, bi gotinek din: Em xwe parçe parçe dikin. Lê mafê me heye ku em xwe nêzikî hevdu bikin û hindekê bijîn.

- Lê jiyaneke a bilind ji bilindiya wê trajediyayê.
- Nexwe!

Hindek caran ez ji xwe re dibêjim lazim e em dagîrkirî bimînin ji ber ku hîngê me taybetmendiyeke xwe heye, ji ber ku em ê qedrê xwe bêtir bigirin, em ê prensîp û xewnên xwe biparêzin, êdî bihayên mezin bi gorî bûyer û derbirînên biçûk nakin. Wextê ku em hêj

dagîrkirî, her tişt li bal me şêrîn û bihadar bû... Mirov, welat, jiyân û şehîd.

Belê niha, kê ji hemûyan şêrînî û bihadariya xwe maye?

Ji van nivîskar û rojnamegeran, ên ku bi qasî xîzê peravan, heta niha kesê nikariye derbirînî ji vê trajediyayê bike û tevî wê, hêj kesekî ji wan qelema xwe neşikandiye.

Xwezî Narîn, xwezî ji xêra Xwedê û Mîrê Mirazan re, Heredot bi meded bihata û bela van pirsyarên rikber ji min vekira. Bila bê û çîroka min û zîlamên axir zemanî binivîse: Ka çawan di mîhraba Mîlîtaya sedsala bîst û yekê de ez qehpîkek tenê ji bo razîkirina qedera xwe a bêtûte û civaka xwe a ne wekxwe.

Carekê ji caran te ji min re gote, ku mirovê Ewrûpî hevsarê qedera xwe digire û li pêşiya xwe diajo!

- Erê, ji ber ku bawerî bi xwe jî heye, ne tenê bi qederê.
- Mirovê Rojhilatî jî bawerî heye, bi gelek tiştan heye, belê tenê bi xwe nîn e.
- Ji bo ku mirovî bawerî bi xwe hebe, gerek e bi kesê beranberî xwe hebe.
- Li Rojhilata pêxember û xelîfan “paytextê mirin û hejariyê”, kê bawerî bi kesê beranberî xwe heye? Bawerî jî maf e, heger ew hebwaye, kuştin û dagîrkirin nedibû. Erê bihostek ji xopana Rojhilatê maye û nehatiye dagîrkirin? Hezkirin, rêzigirtin û parastin hemû erk in û hemû jî li Rojhilatê tune ne ji ber ku mirovê Rojhilatî pêgiriya bi erkê xwe nake... Bawerî bi xwe û bi kesê beranber tune ye.

Wek perwerde, ez jî jinek Rojhilatî me, belê min bawerî bi ê din anî. Min hewl da ez qîma xwe bînim, xwe têbigihînim ku Mihemedê Meyrê tenê kesek e û ne her kes e, tenê yek e ji çil û çend milyonan,

belê xuya ye ku ez optîmîst bûm, ango xwexapandin bû. Heya niha ez çar caran tenê hatime xapandin.

- Tenê çar caran? Ne gelek e heger tu sî û şeş salan di nav çil û ew qas milyon kesan de dijî!

\* \* \*

Tu dizanî Narîn, li bajarek wek Duhokê, bêhemdî xwe mirov tê xapandin. Bêhemdî xwe havî jî dibe, bi taybetî ji xweza û jiyane û zate xwe. Piştî ku tu ji tiştê havî dibî, çêdibe ku tu lê vegeerî, belê piştî ku ji xwe havî dibî, tê çi bikî? Rast e ku çiya li hawîrdor Duhokê hene, lê gelek tiştên din tune ne.

- Wek çi?

- Wek derew, helwest û însiyatîvê.

- Helwest û însiyatîv min zanî, belê derew çawan?

- Derew tune ye, ji ber ku her tiştê diqewime rastiyeke e û gerek e em şermê jê nekin.

\* \* \*

Em havî dibin bêyî ku me hay ji xwe hebe.

- Çawan havî nebin û em ji gelek tiştan mehrûm in?

- Erê. Wek fantaziya zarokiyê, meraqa heyama sinêliyê û sohbetên hevalên dibistanê di der barê gundan û xwezayê de.

Min ji nîva dilê xwe hez dikir ez li gundekî ji gundên deştê jiyane bibim serî, bi taybetî piştî ku min ew xewna bedew û rengdar bi keskesorê û xwezayê dîtî, belê niha ew hez jî nemaye, ji ber ku li ku derê be wek bûnewereke mê, lawaz û biyanî, civak serederiyê bi min re dike bi taybetî regezê nemê.

Me tu kesê xwe li gundan nîn e. Kesûkarên me tenê çend malbat in, ew jî li bajaran akincî ne. Hindek caran ez weku sedem dibînim bo lawaziya peywendiyê di navbera wan û xwezayê de. Mirovên ku peywendiya wan bi xwezayê re lawaz be, ew bi xwe jî lawaz dibin.

Ez gihome wê baweriyê, ku lawazî pirek e bo nemanê û neman jî wateya dawiyê dide.

Narê, pêwîst nake ez xwe bi hêz nîşanî te bidim ji ber ku gelek dem di ser min re bihurîne û min xwe lawaz dîtiye. Û dema ku ez xwe lawaz dibînim, hizira nemana xwe dikim. Belê ji ber ku hestên min rasteqîne ne û dilê min mezin e, min bêhna xwe fireh dikir û ji xwe re digot: Helbet wê kesek hebe û -ji bo min- ji min hez bike. Eha ji bo xatira wî kesî û wê hezkirinê hêj ez zîndî me, min xwe nekuştîye. Min bawer dikir ku ew kes, dûr an nêzik, zû an dereng, wê cihê Semyanê min bigire, belê vê carê di dilê min de.

\* \* \*

Ji sala 83'an û heta sala 91'ê, ji sedsala bîstê, ez çînavê kesê sêyemîn bûm, lê piştî hîngê, ez bi xwe bûme xwegirtiya kesê sêyemîn. Ji hîngê de û heya noke, gelek cih û tişt hatine guhertin, ez jî hatime guhertin, belê tenê zîlamên vî bajarî wek xwe man, hêj ji bo zik û binzîkê xwe dijîn. Mixabin, tu cudahiyê di navbera xwe û heywanan de nahêlin.

- Mirov aqil heye û dikare bandorê li xweza û derdora xwe bike. Belê heywan her dem hewl dide xwe biguncîne ji ber ku ew aqil jê kêr e. Meryema min, ew ne hêja ne ku em cih û dema xwe bi sohbeta wan ve biherimîn. Bawer bike êdî ew nikarin kesekî ji xwe bitirsîn ji ber ku ew bi xwe ditirsin. Mafê wan heye ku ji xwe bitirsin ji ber ku roj bo rojê rût û vala dibin. Dîrokek zîndî û birîndar, ku bi xwînê hatiye nivîsîn, gorî kiryar û reftarên xwe ên biçûk dikin. Bo rûmetî û gendeliyê kes nagihe gûzeka wan. Sîbaq e, ka kîjan wê bêtir rûmetiyê bike, an bêhelwest bimîne. Ne ber aqil e ku berhemê şoreş û serhildanê tenê ev be... Qet ne ber aqil e!

- Ev parçe axê rizgar bû, belê ev parçe mirovî hêj dagîrkirî maye.

- Çima?



- Gelek sedem hene, lê sersedem ew e ji ber ku gewher pîs e. Gewherê mirovî ne endamek e ji laşê wî, lê xweser e.
- Ez xwezîkên berê naxwazim ji ber ku hîngê em nebûn, belê car car dibêjim ne xwezîkên vê gavê jî. Rast e em hene, belê bûne çî? Berê cuda bû, mirovê me dihate çewisandin ji ber ku 'ar û xîret hebû, di avakirina xwe de bilind bû, berê bilindtir bû ji avahiyê Fermangeha Çandinê û avahiyê Nexweşxaneyê Azadî û Flatên Girê Basê, bilindtir ji hotêl û motêlên niha ên ku stêrkên wan nebêtir ji stêrkên ser li milên zabitekê me ê nexwendewar. Belê niha, mirovê me nizm bûye, nizm wek wan mirovên biçûk di çîroka "Xewnek li welatê mirovên biçûk" a çîroknivîsê Japonî "Sanêtzo".
- Û a niha jî... Nêzik e li her gund, qeza û parêzgehê "Taxa Milyonêran" dibe hêma bo şaristaniya me. Belê hêj "Berojkê" hêma ji xewna me a dawiyê re, xewna zîndîbûnê. Ax ji bo berê... Berê Mihemedê Meyrê dikandar bû, belê niha qunterkar an berpirsyar e, berê serê xwe bi gûzanê diteraşî belê niha boyax dike.

### Şoreşger

Berî ku ez behsa Kirmancî ji bo te bikim, dixwazim tu sê kesên din jî nas bikî "Hejarê Pêşmerge, Îslamê Kominîst û Hawarê Îslamî."

Wek ku xuya ye, her yekê ji wan nasavek heye. Sê hebûn, sê ezmûn û sê navên cuda, belê heta radeyekê di pêkhatin û derbirînên xwe de wekhev bûn. Min hizir dikir ku ew taybet in, ango ne wek ên din, lê roj bo rojê ew hizir di serê min de genî dibû. Di zilûmata salgarê de, dixwestin xwe bo min bikin şemal, belê li dawiyê rastî di xwe û min de mirandin.

Li destpêkê min hejar nas kir. Min wiha dizanî ku xortek hêja ye, tu dikarî bibêjî ku heta radeyekê xwedan karîzma bû û hindek binemayên kesatiya îdeal li cem hebûn. Belê paşî, ji min re xuya

dibe ku ew tenê kevalek e ji van kevalên bênavnîşan, ên ku ez bi xwe ji bo xwe nîgar dikim. Ew bi xwe ne milkê xwe bû, tevî wê li milk û emlakan digeriya.

\* \* \*

Di havîna 1992'an de, ez dibêjim meha Tîrmehê bû, bi helketina damezrandina Parlemantoyê Kurdistanê, berî hîngê bi heyamek kurt, ji bo beşdariyê di pêşangehek hunerî de, ez jî hatim vexwendin. Ez bi kevalê “Şûnwar” beşdar bûm, min xelata yekemîn wergirt. Hindek caran dibêjim xwezî min wernegirta.

- Çima Meryema min?
- Ez nizanim Narîn. Belê dizanim ku wî kevalî bi etîkêt şûrhên bilind û qalind ên nîştîmanê min li ber summên dagîrkirina regezê din herifandin.

Di kevalî de, hemû bi carekê diçû, belê tenê zarokek sava li ser milê bira, an bavê xwe, li ser milê xwe dizivirî bêyî ku bigirî. Di kevalê Şûnwar de, min dixwest bibêjim ku jan ji giriyanê derbas bûye. Gelek ji kesên amade deftera mêvanan bi înzayên xwe xemilandin û “Hejar” jî yek ji wan bû. Ne tenê îmza xwe a wek xencera bi destik û kalan, lê nameyeke tijî jiyan, hezkirin û xerîbî nivîsî û li dawiyê, berî îmzê peyva dilsoj û nimreya telefonê jî nivîsî. Nameya wî xweş bû. Belê peyva dilsoj ji hemûyê xweştir bû, ji ber ku pêştir min ji zilamek din nebihîstibû.

Heyamek vala çû, heyamek ne vala hat û dîsan Hejar bi xwe re anî. Vê carê nav bi tenê Hejar mabû. Tola xwe ji gelek tiştan vekir û berî her tiştî ji hejariyê. Ew li min digeriya. Wek ku wî digot, pêjna min nedihat. Piştî ku cihê min nas kir, nameyeke din bi zarokekê re şand û tê de behsa xurbetê û şûnwaran dikir... Şûnwarên kevn û şûnwarên nû.

Ew bi xwe, piştî ku hejar qesta çiyayî dike, Duhok bo wî dibe şûnwar û bîranîn. Û piştî ku ji çiyayî vedigere, îcar çiya bi xwe ji bo wî dibin şûnwar û bîranîn. Wexta ku wî Duhok li pey xwe hişt, temenê wî bîst û yek sal bû. Wî çaxî ez sêzdeh salî bûm. Tu fam dikî ez dibêjim çî?

Hejar jî wek gelek meraqdarên kurdîniyê, têr bi çavê serê xwe dîtibû. Wek dîmen, te digot qey pîremêrek e tenê gopal û destek tizbiyan jê kem e. Belê wek ruh, tijî çavên wî berîq bû. Hindek saxletên me wekhev bûn, mîna hêminî, meraqdarî, bêdengî û...

- Û tirs?

- Erê. Tirs ji duh.

\* \* \*

Tirs ji duh Narîn can.

Ez ê Pirsyarekê bikim: Erê carekê ji caran tu ji duhiya xwe tirsîyayî?

- Erê, berî ku ez qesta Ewrûpa bikim!

Hindek caran ew tirs nahêle mirov roja xwe wek ku bixwaze bibihurîne, an siberoja xwe geş bibîne. Şert nîn e ku duh an suba ê her keçekê li vî welatî, Mihemedek tê de hebe da ku bitirse an netirse, û şert nîn e jî ku paşnavê her Mihemedekî jî “Meyrê” an “Mehdî” be.

Hejar wek xwe bû. Belê piştî ezmûn û peywendiya min ligel wî, min got rehmet li Mihemedê Meyrê be ji ber ku vê dawiyê tiştê din baştir nebû ku bide min, lê Hejarî hebû, belê neda. Û heyam dibihurin...

Û Hejar ê ku li piraniya deman xwedanê kesatiyek nersisî, bi her tiştê xwe dewlemend dibe, tenê bi dilsojiya xwe hejar dibe. Li heyamên destpêka peywendiya me, hindek caran dema ku behsê keval û rengan dikir, te digot qey hunermend e, huner xwendiyê. Behsê hindek stîl û xwendingehên hunerî dikir, her wisa behsê

karên “Picasso, Salvador Dali û Van Gogh” jî. Li vê Duhokê, kêman kesan wek wî di der barê huner û hunermendan de dizanî. Carinan, ez zivêr dibûm ji ber ku li demên hevpeyvînan pirsyarên pirrehand ji min dikirin, lê min bersîv nedizanî, bo nimûne: tu cudahî di navbera hunerê hêmayî, klasîkî û romantîkî de heye? Berî ku ez hindêk pirtûkên felsefê bixwînim, ne min bersîva rast dizanî, ne jî cureyên hunerê xwe nas dikir.

Bi saya ezmûna xwe bi dem û regezê din re, ez giham baweriyê ku hezkirinê pêwîstî bi tu egeran nîn e, belê piraniya deman pêwîstî bi zemîne û delîvan heye. Ne tenê ji ber hunerî, belê ez dibêjim nebûna jinê li nav pêşmergan, hêla ku Hejar zû bibe heval û paşî dilê wî bikeve min.

Têkiliya me du salan berdewam bû. Wek heval, paşî wek evîndar. Dem bo demê em digihane hevdu û me cih û kêlîkên jivanên xwe bi soz û romansê dixemilandin û heger derfeta hevdîtîne neba jî, name di navbera me de hebûn. Heya niha nameyên wî mane, min bo dîrokê, - dîroka xwe û ne a kes din- ew name hilgirtine. Bi rastî me hindêk rojên xweş bi hev re derbas kirin... Car dibûn du masî di Ava Mezin de, car jî dibûn du kevokên spî li “No fly zone” ê.

- Ê carên dîtir?

- Nizanim. Lê tu dikarî bibêjî du pirsyar.

\* \* \*

Paşî ez ê bizanim ku ezmûna Hejarî li nava çiyayan heta radekê barê wî giran kiribû, bandorek negatîv li reftar û mantelîteya wî kiribû. Psîkolojiya wî wek a mirovê şorşivan lê hatibû. Ango, her tiştî li gorî armancê dike. Di sala duduyê de ji têkiliya me, mirada min ew bû ku carekê tenê jî wek mê serederiyê bi min re bike, ne wek şikeftê an neyarek. Belê di kûratiyên min de li hindêk şikeft û neyaran digeriya û nizanim çawan bi ser hil bû. Ew heta radeyekê di

meseleyên cografî û diyardên xwezayê de şareza bû. Navên gelek ji rêk û deveran, giya û çîçekan, heywan û nesaxiyan dizanî.

Car car min pirsyara heyamên kevn, wextê ku hêj pêşmerge, araste dikir wek: te çi dixwar û vedixwar? Li ku derê radizayî? Gava ku xerîb dibûyî, te çi dikir?

Her bersîvek ji wî dikaribû bibe kevalek, belê li şûna ku bersîvê bide, ji min aciz dibû. Nedixwest ez wan heyaman bînim bîra wî. Wisa ez têdigihandim ku wî divê ji bîr bike digel ku ew heyamên dijwar bi tenê di dîroka wî û gelek kesên din de dikarin bibin cihê şanaziyê.

- Çawan peywendiya we bi dawî hat?
- Bi trajîkomyayêke din...
- Dawî ku hêdî hêdî kesatiya wî bo min aşkera bû.

Li bîra min tê, bi helketina cejna Newroza 1994'an, roja yekşemê, min daxwaznamek jê re şand da ku roja din, di pêşangeheke hevpar de amade bibe. Min hevalên hunermend pê haydar kiribûn, ku Hejar jî wê amade bike. Ji wan re bûbû meraq ku wî nas bikin. Belê bi behaneyê zêdebûna karî û kêmbûna demê, mixabin nehat û lêborîn jî nexwest. Dawî yek hefteyê, min bi riya telefonê peywendî pê re saz kir, belê wî bi zimanekî hişk ez axaftim û hewl da bihayê karê min erzan bike. Bi kerb û kîn, got: "Meryema, ji xwe re li karek din bigere, huner tu nanî nade te!"

Û ez ketim gumanê. Ev Zarê Mezin e û dêmê xwe bi maskarê pêşmergek kevn dinixumîne, an bavê min Dêwalî ye ji bêçarebûna xwe vê şîreta dereng li min dike ji ber ku li ser min ditirse, an jî bi rastî aşîqek e û rojekê ji rojan biryar dabû ku berjewendiyê xwe li gorî evîne û prensîpan bike?

\* \* \*

Dawî sohbeta telefonê bi çend mehan, piştî zanî ku dilê min maye û ji bo ku sulhê bi min re bike, ez vexwendim şevbuhêrkeke taybet li palêsa xwe li “Şaxkê”.

Roja Înê bû, wek ku birayên Misilman dibêjin “Rojê xêran” bû. Tê bîra min, ew jî yekê Tîrmehê bû. Dem nîvro bû, hêj ew li ser karê xwe bû. Hîngê min nedizanî çî karî dike. Ez bi du çavên qerimî ji ber kêmrazanê, çûm bazarê û min du weqiyên belgên mêwan kirin ji ber ku bêqam ji apraxan hez dikir, her wisa hindêk lobikên ter jî da ku bikêlînim û wek meze pêşkêş bikim. Min ji dil dixwest şevbuhêrkek a me panoramaî be... Aprax, nergîle, meze, vexwarin, keval, muzîk, bixûr û hindêk tiştên din ên mê.

Destek kilîtên suxme li bal min hebû. Wek gelek rojên din, ji ber qentera palêsê heya balkonên odeyên razanê min wek neynikê teyisand. Der û cîranan hizir dikirin ku ez kabaniya palêsê me. Bi meraqa kabaniyê, min mehfûra avirmîştî seranser erdê holê radimalî û mehfûrên ecemî, ên ku bi dîwarên gêçê ve hilawîstî, dakutan. Piştî şîvxwarinê, min nergîleya wî hazir kir û maseya darxweriskî bi hindêk meze û vexwarinê xemiland. Bêhna bixûrê û dengê muzîkê bi pêlên bayê êvarê re ji perdên gulgulî bihurîn. Wekî din jî, bi saya pencerên tarî ez bi tenka etekî, bi azadî li nav palêsê digeriyam. Şeva pêştir min ji xwe re gotibû: “Kirêt e ez destvala biçim”, lewre jî min kevalek nû nîgar kir “Sêvek sor bi darek rût ve” û wek diyarî bo odeya wî a razanê bi xwe re bir, belê min bo dawiya şevê hişt, wek surprîz. Wî nedizanî ku keval li ber pêpkê qenepê ye ji ber ku di nav parçek qumaş de pêçayî bû. Ez tu car kevalan di nav rûpelên rojnameyan de napêçim.

- Rojname ên xwandinê ne.
- Rast e, ji xeyrî wê, rojname kevalan pîs dîkin.

Bi her hal... Wê şevê heta saet yekê spêdê ez li bin xîveta bendemanê diwestiyam. Wek şitla rîhanek bêav, stûyê min xwar dibû. Bêtir ji carekê xewê dilê min girt belê her bêhnekê vediciniqîm. Min firek ava tezî li navçavên xwe kir, min nedixwest ew bê û min razayî bibîne. Min diviya ez bi kelegerma bêriya xwe wî hembêz bikim û êdî bernedim ji ber ku ew çend roj bûn min nedîtibû. Ew ligel hevkarên xwe -wek ku wî digot- bi hindêk hîsabatan ve mijûl bûbû. Piştî nîv saetê bi fîtik hat û atmosfera palêsê bi carekê guhert. Bi tirxanên axayekî demê ku afirîniyê li berdestkên xwe dike, bi milek xwe ez li hembêza xwe a sar girtim û aleka xwe bi a min ve nûsand. Min hez dikir ew eniya min maç bike, an lêvên min bigire, ji ber ku destpêk bû û pêwîstiya min bi hêz û avendê hebû.

Wî reftarê sar çokên min sist kirin, min hest kir ku ez helametek im li ber bayê bêndera guman û pirsyaran dihejim, pîlaxên min her yek bo xwe çû belê ez pê dihisiyam ku piyên min di erdê de çiklandî ne. Li nîva holê, li ser qenepeya sor, wek sultanek xwedî mîratek dîrokî, xwe li ser erşê xwe terihand. Wî nergîle kişand û ez jî mîna cariyekê bendewar im ku bi amajekê, ji dest an çavên xwe, fermanekê bide da ku ez bêdudilî bi cî bînim. Ez li kêleka wî rûniştî bûm, her bêhnekê min pêlên agirê nergîlê ji xweliyê dikutan ji bo ku henasên dûkêlê safî bibin. Wî jî her bêhnekê, geh bi awir geh jî bi sertilên xwe bedena min dipîva. Heta hîngê ew sar bû, belê wexta ku min jî sertilên xwe gihandin pîlaxên wî min zanî ku germ bû ji ber ku nergîle avêt û got: “Îşev tu bûk î û ez zava me.”

Nizanim çima ew hevok li guhê min xweş hat. Mixabin, paşê ez ê bizanibim ku mebesta wî berwext bû.

Destê xwe bi serê min de anî her weku dilê wî bi min bişewite. Di wê kêlîkê de, min bavê xwe Dêwalî dît û çavên min tijî bûn, belê bi ser de neçûn. Min diviya ew kêlîkên watedar dirêj bibin, lê ji nişka ve Hejar bû gurgêk û xwe avêt min piştî ku dîmenê hindêk keçkên gêrîla ên çekdar di nava berfê û şikeftan de li ser ekranê dîtin. Bi çavê xezebê temaşe dikir û bi selîqek tûj û axaftinek seyr şeva me - a ku gerek e taybet be- têk da, wî got : “Pere ji bo xerckirinê ye, neyar ji bo kuştinê ye û jin jî tenê ji bo ganê ye.” Ez guman dikim ku gotin a wî bi xwe be ji ber ku pêştir min bihîztibû.

Ew yekemîn car bû ku min tu pêwîstî bi guhan nebe. Bêhemdî xwe ez bo Hejar ê Şoreşger giriyam û bêhemd jî ez bi Hejarê aşiq keniyam. Bi bangê spêdê re, ez derketim û min ew bi tenê di mal de hişt. Heya serê kolanê ew li dû min hat, belê ez li xwe nezivirîm ji ber ku gelekên din li pêşiya min direviyan... Meryema a sêwî, keçika hunermend, aşîqa dilrizî û Kurd a dîl.

- Niha ew çî dike, li ku derê ye?
- Niha bûye bazirganê çekan li ser tixûbên mirinê.

Gawir

Heta Tîrmeha 1996'an ez di xelwetgehek sawêr û sebrîn de bi tenê mabûm. Ez ji te venaşêrim, heyamek pir zehmet bû, belê tu kesî heqareta min nedikir, kesî hestê min birîndar nedikir. Li vî bajarî ku bi tirsê firşik bûyî, heqaret û birîndarikirina hestên mirovan wek ferza nimêjê ye.

Belê kes li nik wan sînoran ranaweste. Heyamek tijî saw bû, welê azad û vekirî jî bû. Bi hêsanî min dikarî bibêjim erê an na.

Narîna min, ez bawer dikim ku ji xeyrî ezmûn û azadiyê, wekî din baştirîn delîve ji bo pîvana karînen mirovî, xelwetgeh e. Min tişteki taybet nemabû ku ez li ser bitirsim. Di her du salên tenyatiyê de,



min hewl da hunera xwe bêtir nas bikim, ew jî bi riya xwendin û praktîzê ji ber ku ez dibêjim, dahênan heya radeyekê bi praktîzê ve girêdayî ye. Di du salan de min karî bîst û çar kevalan nîgar bikim, têrî pêşangehek kesatî hebûn digel ku vekirina tu pêşangehan di hizira min de nebû çunkî rewşa min, bi taybetî ji aliyê derûnî ve, nekês bû.

Yekê Tîrmehê, derz, perdên qetandî, marên kore û dûkêla şemendefirê bûbûn sembolên serekî di kevalan de. Di hindê kevalan de, hemû sembol dûtî min digihane hev.

Dibe ji ber ku ez mê bûm, behra bêtir ji mêvanên geleriye wisa dizanîn ku kevalên min jî wê mê bin. Hizir dikirin ku tenê kevîz li peravên min hene, tenê sêv bi çiq û takên min ve şor dibin, tenê xecxecok di avên min de şîn dibin. Ji wî xulyaqetî, tenê du kesan ji kevalên min fam dikirin, ew jî Kovan û Kajîn. Ewan jî nedikarî bo kes din behs bikin çunkî ew sembol bi birînên min ve girêdayî bûn û wan nedixwest kesek biyanî destê xwe deyne ser birînên min. Ez, bi duristî sedema bêdengiya wan nizamim, belê dizanim ku bi şanazî digotin: "Xweha me a mezin e."

\* \* \*

Berî ku pêşangeh bi dawî bê, li roja siyê xortek spehî di hola pêşangehê de serinca min kişand. Sîmayên wî biyanî bûn. Rojnameyek di bin kefşê wî de pêçayî bû.

Bîreweriya min baş e. Mebesta min, heger min berî hîngê ew xort bidîta, min ê ew nas bikira. Wî xortî, bi hûrbînî li kevalan dinihêrî. Te digot qey li kevalek wînda digere, an bazirgan e û kevalan kontrol dike berî ku bikire. Jixwe heger me rexnegir heban, min ê bigota çêdibe ku ew rexnegirek be. Beranber her kevalekê radiwesta û berçavkên xwe diîna serê difina xwe a rast da ku hûrayên hunerî tê de bibîne. Çavên wî ên şîn gelek ciwan bûn, belê xuya ye ku kê

bûn, mixabin. Piştî ku li her kevalê dinihêrî, li ser milê xwe dizivirî û di nav wê xergelê de, wek siyasetmedarekî li dema gotûbêjan, awirek diweşand semta min. Te rastî bivê, ne tenê rijdî û pûtedana wî bi kevalan bala min kişand, belê qiyafeta wî jî bi taybetî cilên wî ên reş... Xwerû reş. Bejna xwe a zirav bi sakoyek ji rengê şevên vê herêmê nixumandibû, xawliyek ji eynî rengî li stûyê xwe alandibû. Te digot qey xelkê Eskîmo ye û riya xwe winda kiriye.

Wî jî wek gelekên din, deftera mêvanan îmza kir û bi serê lêvan aferînî li min kir. Parfuma wî a xweş henasên min li dû xwe birin, berevajiyê bêhna xwêdana binkefşên hindê kesên din, ku pozê mirovî dişewitîne. Kita mûyên spî li cênîkên wî hemû demsal, bi taybetî demsalê zîvistanê, li bîra min anî. Min hest pê dikir ku wî dixwest bi min re bide û bistîne, lê nedikarî ji ber ku pêşangeh hêdî hêdî vedirevî û hindê mêvan çaverê bûn ku silavekê li min bikin û min bêtir biniyasin. Her bêhnekê li demjmêra xwe a zer û qayîşreş dinihêrî. Min xwe têgihand û li gor etîkêta hunermenda xwedan pêşangeh, min însiyatîv kir: “Seyda, ji kerema xwe bêhna xwe fireh bike, bimîne ji ber ku min hindê axavtin heye” yekser ew têgiha û bi her du çavên şîn gîrnijî, got: “okey xanim, spas.”

\* \* \*

“Meryemaxan, spas bo derfetê û însiyatîvê. Ez pir ji pêşangehên hunerî hez dikim, girîng nîn e hunermend kî be. Pêştir min navê te nedizanî, belê paşî min li ser her kevalî dît. Ez nizanim ji ku derê dest pê bikim, ji ber ku bi rastî hemû kevalên te bedew in... Hunera te bêqam ciwan e. Belê min diviya axaftinekê bikim vêca nizanim wê bibe pirsyar, an rexne, an jî tişteke din.”

Min li çavên wî dinihêrî. Belê wî li dîmenê min û rengê cilên min dinihêrî û maf da xwe ku bibêje: “Tu bi xwe jî kevalek î, lê ji hemû kevalên din ciwantir î.”

Bi dudilî wiha got û bi sertiliya xwe berçavka xwe durist dikir. Ez ji peyvên wî zivêr nedibûm ji ber ku mirovatiya wî bi ser regezê wî de zal bûbû. Nermebayek di navbera min û wî de dihat û diçû. Min hest kir ku ez keçek sinêle me û lawek hevsal xezelê bi min dike. Nizanim çima, lê di wan kêlîkan de hemû bîranînên dijwar ji bîra min çûn û hestên min ez weku mê, ne wek hunermend, dame naskirin. Min digot qey ez ne li hola pêşangehê, belê dîsan li wî zemanê din, li nav zeviyên pembû piştî ku keskesorê ez hilgirtim wek ku li destpêkê min behskirî.

“Kerem bike hêja, axaftina xwe bibêje”, min wiha got û paşî wek şagirdeyeke belengaz li qonaxa seretayî min destên xwe deynan serhev da ku guhdariya wî bikim, belê wî neviya wek mamostayekê reftar bike.

“Bi rastî rengên kevalên te ciwan in, belê dilê te ji min nemîne, piraniya wan sar in. Erê, çima te rengê sor bi kar neynaye?”

Min wisa zanî ku axaftina wî bi dawî hat. Belê berî ku ez dest pê bikim, dîsan berdewamî pê da û bi sanahî yekem xweriste li ser xwe da min, got: “Bi rastî, kêfa min ji kevalan re hat û heta radeyek mezin ez pê daxbar bûm, lê dîsan dibêjim; ku te rengê sor bi kar neynaye.”

Berî ku ez bersîva wî bidim, min pirsyarek kir, min got: “Bibore hêja, hêj ez navê te nizanim. Tu dikarî xwe bidî naskirin?” Bi awayek jixwerazî, bersîv da û got: “Îslam. Navê min Îslam e.”

Bi bişkurînek xav û çend peyvan wek komplîman, min xweşhaliya xwe derbirî û ji bo ku wek Hejarê pêşmerge ew jî nebe mamke -vê carê ez wek mamostayekê- li dor zivirîm û min pirsyar kir: “Kekê Îslam, ez dikarim bizanim ka tu çi kar dikî?”

Wî got: “Berî niha, min karê rêkxistinê dikir. Ez kadroyekî partiya komunîst bûm belê niha bêkar im.”

Narê can, ez dizanim bêkarî çiyê, lê nizanim çawan diqede. Ew bi meraq li hêviya min bû ku ez bersîvê bidim, ka çima min rengê sor bi kar neynaye? Bi qeyd û mebest min got: “Ji ber ku min bawerî bi şoreş û eşqê nemaye.”

Li gel bersîva min a sade, ew li çep û rastê xwe zivirî her weku li mizgeftê û qametê digire. Rojnameya pêçayî ji binkefşê xwe anî der û kir di binkefşê xwe ê din de. Dîsan bi sertilan berçavka xwe durist kir û pena bo pirsyarek din bir, got: “Bi rastî tu ne tenê hunermend î, lê xuya ye tu rewşenhizirî jî.”

Bi bîstehî, min sersamiya xwe bi awir û peyva “Bibihurîne” nîşan da ji ber ku ne ber aqil e ku kesê hunermend, heya radeyekê, rewşenhizir nebe. Diyar e ji devê wî derket lewre jî yekser lêbihorîn xwest: “Tu li min negire xanim. Mebesta min ew e ku tu dikarî serederiyê ne tenê bi rengan re, belê belkî bi peyv û hiziran jî re bikî.”

Bi awayekî ji awayan viya min têbigihîne ku ew jî hunermend e, lê di hunera peyv û zimanî de. Min hewl da behsa rastî û nerastiyê bo bikim ji ber ku dema wî diaxift gotina “Bi rastî” gelek bi kar diîna. Min diviya wî têbigihînim ku pêwîst e hemû cureyên xebatê rasteqîne bin belê paşî ez bêdeng bûm çunkî ew kadroyekî partiya komunîst e û ne ber aqil e ku têngihe. Kesê hunermend an kadro gerek e bi xwe û her kes din re rast be, pêwîst nake sond bixwe an ji kesê beranberî xwe bixwaze ku jê bawer bike, ji ber ku bawerî mîna zekatê ye, pêwîst e tu bidî ne bixwazî.

Bêyî ku ez pirsyar bikim, wî delîve bi kar anî û behsê xwe kir. Got ku car car pexşanê û têkstên edebî dinivîse û heger destûra min hebe

ew dixwaze li ser hindê kevalan binivîse. Min bi spasî ve pejirand û destûr da. Belê ez bi hestîsivîkî veperiyam ku agah ji sembolên min hebe.

Destê xwe deyna ser sînga xwe, got: “Soz be, bi rastî ji bo min meraq e ku ez fonksiyona wan sembolan di kevalên te de bizanim... Ez ji dil hez dikim ku em careke din hevdu bibînin, te got çî?”

Min jî bo sohbet jê re got: “Wek ku birayên Îslamî dibêjin Xwedê kerîm e.”

Karta ku nimreya telefona wî li ser, da min û çû berî ku bibêje: “Ez li benda te me. Heger te viya peywendiyê saz bikî, dudil nebe.”

\* \* \*

Min karta telefona wî wek bazbendekê kir di paxla xwe de. Bêhemd, Zarê Mezin û Mihemedê Meyrê hatin bîra min. Heyamek bihurî bêyî ku ez telefona wî bikim ji ber ku min kart wî kiribû, an li cihek asê veşartibû. Ez bi eshî nizamim. Ez bi hunerê û karûbarên rojane ve mijûl bûbûm. Min ew ji bîr kiribû. Belê gava ku min zilamek bi cilên reş bidîta, demlîdest, ew li bîra min dihat. Her wisa axavtin û livînên wî jî nemaze dema gotî: “Tu bi xwe jî kevalek î, lê ji hemû kevalên din ciwantir î.”

Dawî heyamekê, wek her heftiyê min zincîra rojname û kovarên lokal ji bo xwe ji bazarê kirîn berî ku qesta malê bikim. Min hindê pirtûk jî di der barê hunerê de kirîn û hemû bi erzanî ji ber ku kevn bûn, xuya ye ku kes pê razî nedibû. Di taksîyê de, bi tiyê çavan min berê xwe da manşêtên wan rojname û kovaran heta ku bigehim malê û paşî bi hûrayi bixwînim. Ji nişka ve, çavê min bi manşêtekê ket, li ser rûpelê rojnameyekê nivîsî ye “Min bawerî bi şoreş û eşqê nemaye.”

Min zanî ku ew axaftina min e, ku kîngê û li ku derê û bi kê re, min kiriye.

Li rûpelek din di eynî rojnamê de, min wênê kevalek xwe “Dûkêla Şîmendîferê” dît û parçe pexşana Îslamî xwend. Bi şêweyek hunerî nivîsîbû. Pexşanek baş bû belê hevokek seyr di wê pexşanê de, destpêka dîroka min bi wî re nivîsî, ew jî ev bû “Heger ku xwedana van kevalên sêhrî bawerî bi şoreş û eşqê nemabe, êdî bila kes ji me nebêje ez şoreşger û aşiq im.”

\* \* \*

Serê min bû kaniyek ji gumanê û herikî.

Min ji dil diviya wî bibînim da ku spasiya xwe araste bikim belê roj dibihurîn û viyana min li cihê xwe dima. Min nikarî bêtir berhingariya hestên xwe ên hevdij bikim. Li dawiyê, min biryar da, ku ber bi avahiyê wê rojnamê biçim û pirsyara nimreya telefon û navnîşanê Îslamî ji redaksyonê an ji sernivîskarî bi xwe bikim. Gotin jê re navê, wê bi spasî ve weca min biqedanda tenê ji ber ku ez mê me.

- Sernivîskar jî wiha hizir dikin?
- Mixabin, heya niha wiha hizir dikin.

Li dawiyê bextê min di hawara min hat. Berî ku ew qencî jî bibe minetek an rojekê ji rojan bibe axavtinek, li ber dergehê avahiyê rojnameyê ez pêrgî Îslamî bi xwe hatim.

“Gidî, ez li asîmanan li te digirim lê tu li erdê bi dest min dikevî.”

Min li çavên wî dinihêrî û di dilê xwe de wiha got.

Îslam mirovek bextewer bû ji ber ku tu axavtina wî dixwest ji min bibihîse, bêyî ku bixwaze, min diîna ser ziman.

Paşî ez vexwendim bo şîvxwarinê. Şîveka hunerî wek ku wî digot. Hîngê ev cihên taybet nebûn lewre em çûn cihekî veder li “Zawîte”, ew jî cihek bedew bû. Li hindavî me, darkajan bejnên xwe li ber pêlên bayê êvarê ba didan û li nişûv jî mirovên peyade bi dengê nizm dihizirîn. Li cihek wisa veder jî tu nikarî azad bibî. Kesên ku bi

rêbarî dibihurîn, li semta me nedixivtin belê bi awiran her tişt digotin. Gerek e mirov xwe ji wan aciz neke ji ber ku jiyana bi xwe hêj diyarde ye li van welatên ku heya niha tenê seqayê wan baş bû belê diyar e ku ew jî ber bi xerabiyê diçe. Ma kî nabêje ku awirên wan wateyek erênî didin, wek ku bibêjin “Xwezîkên we” an “Xinêka we” an her gotineke din bi merc ku derbirîna ji hesretên wan bike?

Ez dibêjim ku xelkê me hêj nikare wek pêdivî derûna xwe bi duristî derbibire. Lewre jî, heger me xwest hizirên wan bixwînin pêwîst e biçin di serên wan de. Û heger me xwest niyazên wan jî kifş bikin pêwîst e biçin di dilên wan de.

Narîna, wek rêzîgirtin ji bo dem û daxwaza Îslamê, wê êvarê ez bi hemûyê xwe ve bi wî re bûm, belê Hejarê pêşmerge jî di her kêlîkê de bi min re bû. Digel ku du kesên ciyawaz bûn, tenê bi regez û dawiya xwe bi min re wekhev bûn, belê dema ku min berê xwe dida Îslamê, min sîmayên Hejarî didîtin.

Me xwarin xwest. Wek vê gavê li bîra min e, min neferek kebaban xwest û Îslamê jî neferek qûzî li ser birincê. Berê xwarinê me bi hindêk selate û vexwarinê xwe mijûl kir. Îslamê diviya hizir û ramanên xwe derbasî mejiyê min bike belê bi xweşikî. Min jî diviya ez wî bidim axaftin da ku seng û astê wî ji nêzik de nas bikim. Baştirîn babet jî kevalê dûkêla şîmendîferê û parçepexşana wî bû. Dawî ku sakoyê xwe ji ber xwe kir û deynayê ser qeraxê masê, got: “Eve heyameke û ez hizirên te dikim. Min gelek pêşangeh dîtin û gelek hunermend jî nas kirin, lê yekem car e ku ez pêşangeha bi dilê xwe dibînim û hunermendek rasteqîne nas bikim. Meryema can - berê hîngê ji min re digot Meryema xan- di nav komunîstan de mirov fêrî gelek tiştan dibe, belê tenê fêrî derewan nabe, lewre jî ez rastiyê dibêjim.”

Wek mêvanê biyanî dema ku xwedanê malê diaxive, min guhdarî dikir û her bêhnekê serê xwe dihejand. Min diviya ez pirsyara sakoyê reş bikim ka çima havînê jî li xwe dike? Lê li bîra min hat ku carekê dema wî behsa kevalan dikir, gotibû: “Ruhê min sar e, min tu car germ nabe”, belê gava ku behsê rastiye kir, bi kurtepirsyarekê min ew li nîva rê rawestand, min pirsyar kir: “Rastiya çi hêja?” wî jî bi zîrekî bersîv da, got: “Rastiya hestên xwe can -berî niha Meryema can bû belê niha bûye can- ez hêvîdar im rojek bê û delîve helkeve da ku em bêtir hevdu nas bikin, wî çaxî tu bi xwe wê hestên min aşkera bikî ji ber ku bi hemû peyvên min û rengên te ew hest nayên wergeran.”

Min zanî mebesta wî çi ye, ez pê dihisiyam. Çavên wî karîn wan hestan, ne tenê wergerînin, lê bigihînin jî. Belê min dizanî jî ku hêj zû ye ku nakokiyek nû di nava min de çêbibe ji ber ku birînên min ên kevn hêj germ in.

“Dibe ku min bi gezaf li ser kevalên te nivîsîbe. Heta radeyekê ez ditirsiyam ku tûşî rexneyê bibim, belê hestên min bi ser hizir û ramanên min de zal bûbûn.” Ewî bi têwerdan wiha got.

Bêhûde, min hewl da babetî biguherim belê hêza fişara hest û sozê di kûratiyên wî de dipengî û ew han dida ku ji dawiyê dest pê bike: “Meryema, ez dikarim pirsyarek kesatî ji te bikim?”

Lê kîngê taybetmendî li nav kesên pîrbêj û bêkar hatine parastin. Heger ne bi tundî be helbet bi etîkêt tînetî hetikandin. Min nedizanî ew ê kîjan pirsyarê araste bike, belê min xwest bizanim lewre min serê xwe lê hejand wek bersîvek erênî. Bi selîqek şermîn pirsyar kir, got: “Te heval heye?” Min jî bi bersîvek nermîn bersîv da, min got: “Nexêr. Min heval nîn e.”



Min pirsyara wî fam kir. Belê mixabin wî bersîva min fam nekir. Min zanî ku ew behsê “Yar” dike, belê wî nizanî ku ez behsa “Heval” dikim.

Bi rastî jî ez bêheval bûm û pêwîstiya min bi hevalan hebû. Belê li civakek Îslamî, Rojhilatî û kevneperst ku hêj li gor yasayên miriyan dijî, kî razî ye, an kî diwêre hevaliya keçikek ji keçîniyê hatî xistin, bike?

\* \* \*

Min cixareyek ji pakêta wî anî der û wî bi xwe ji bo min vêxist berî ku ez hindêk ristan bidim berhev û demê pê bikujim.

Hindêk caran dem jî dibe bela serê mirov. Min got ku Marksîzm di gewherê xwe de li ser du bingehan pêk tê. Bingehê yekê: Metiryala diyalêktî, ango dîtina felsefî û zanistî bo hebûn û cîhanê. Bingehê duduyê jî materyala dîrokî, ango xwendina yasayên pêşkevîna civakê mirovatiyê û şewên pêkhatin û bercestekirina civakî di formên cuda cuda de. Di yek rûniştinê de bi bûnewereke mê re, Îslamê komunîst Marksîzm hemû ji bîr kir. Eniya xwe kir girêk û madê xwe tirş kir, got: “Bi rastî dem ne dema Marksîzmê ye. A baş ew e, ku ez û tu li cih û demek wisa, behsa xwe û jiyana xwe bikin, ne behsa felsefeyê kevnar.”

Strêsê ez girtim. Hizira min a sext berbelav bû. Min cixare vemirand û bala çentê xwe kir da em bizivirin Duhoka ku bi roj teng û bi şev tarî ye, belê wî zû helwest çareser kir û li hawara xwe û min hat dema gotî: “Meryema can, ez di bîst saliya xwe de giham partiya komunîst. Min gelek xwend. Ji bo xatirê hindêk xulên hişyariyê û avakirina kesatiya xwe wek kadro, partiyê ez şandim derveyî welatî, ez çûme Moskova, Prag û Şamê. Wek ku tu dibînî, porê min nîvek spî bûye û hemû jî ji qehrên siyasetê de. Teorî, ez jî wek piraniyê gelekî dizanim. Belê praktîk kêr dizanim, pir kêr. Ev şanzdeh salên

min çêbûn ku ez hewl didim, lê heyhat. Xelk hemû bû hizbî û bi kêr xwe hat, belê ez ji a xwe venebûm tenê ji ber ku min bawerî bi prensîpan anî. Tu dizanî wan prensîpan çî bi serê min anî? Şanzdeh sal ne kêr in ku mirov karekî bike, belê gelek in ku mirovî hejar û belengaz bike. Bêtir ji carekê ez hatim girtin û tûşî îşkencedanê bûm, hem berî serhildanê hem jî piştî serihildanê, belê kesek li hawara min nehat bi xwe hevalên siyasetmedar jî.”

Narîna min, her du çavên wî wek du stêrkan diçirûsîn, hîngê min hest dikir ku Îslam bi min û xwe her duyan re rastgo ye. Rastî ji çavên wî diherikî. Bêtir ji cixareyê kişand, hêj nîvî vedimirand û dest diavêt yeke din. Te digot qey ew bi xwe re diaxive, bêsansor, bêtirs û bêkomplêks a ku nahêle piraniya zîlamên vî welatî a dilê xwe li hember jinê bibêjin.

Ligel bayê girnijîna min û guhdariya min a xweş wek ku wî digot, berdewam bû, got: “Ez hevalê antropolojiya radîkalî me... Dilê min bi hejaran dişewite, bi şev û roj hizira wan dikim. Ez bawer dikim ku ez li ser meraqên wan, li ser peydekirina pêdiviyên wan ên rojane, her wisa li ser xurtkirina karîn û alavan jî ji bo pêşketina wan ji hemû aliyan ve gelek riya û xemxur im. Ez dixwazim ew bi kêrî xwe bîn û tiştê ji çarenivîsa xwe bizanin, hez dikim kawdan û destûdarê materyalî xweş bibin da hindêk asoyên nû li ber wan vebin.”

Bêhemdî xwe, ez rabûm ser xwe û min ew hembêz kir, ne ji ber ku ciwan axift, belê ji ber ku ez yek ji wan hejaran bûm û wî nedizanî. Wek ku min gotî, her du çavên wî diçûrisîn belê beravên mijûlankên wî karîn xwe li ber lehiya êsiran bigirin. Destê min maç kir û vê carê bi selîqek rastyar, got: “Meryema can, ez ji...”, berî ku hevoka xwe tamam bike min destê xwe dayna ber devê wî û got: “Hêj zû ye Îslam, lezê neke.”

Ew aciz nebû û ez jî aciz nebûm ji ber ku bi serê lêvên xwe sertilên min maç kirin û wî bi qasî ava oqyanûsekê eşq berda kelexê min ê zuha. Berî em bizivirin, dîsan nimreya telefona xwe da min belê vê carê li ser destê min nivîsî da ku winda nekim.

\* \* \*

Zû an dereng, min dizanî ku ew ê hezkirina xwe bo min ragihîne ji ber ku heman hest li bal min jî peyde bûbû, lê ez li benda însiyatîva wî bûm. Çendî xweş e Narîn, dîsan pinpinîkên eşqê bi dirêjiya bînahiyê difirîn û semaya azadiyê ji bendên tenhistanê saz dikirin, belê li pişt perdeyên rastiyê ên qetandî ew pinpinîk dihatin terorkirin û ez li ser digiriyam. Ez li ser hemûyan giryam... Dayik, bav, kur, keçînî û xewna dawiyê. Hemûyan dikarîn hêj bimînin ji ber ku pêdiviya min bi wan hebû, lê her yekê ji wan biryara xwe da û giha heqê xwe. Tenê ez û ev welat e mane... Bi dizî ve li ser hevdu digirîn.

Erê çi maye û ez li ser negiriyame?

\* \* \*

Îslamî her şev telefona min fikir bi taybetî li nîva şevê. Ew şeva ku wî nekiriba jî, min bi xwe fikir. Guhên min fêr kiribûn dengê xwe ê xweş. Dengê wî gelek xweş bû bi taybetî bo xwendina helbestê û pexşanê. Hindek caran bo sohbet min jê re digot: “Guneh e ev dengê ew qas xweş ne ji bo bangê Xwedê be. Here mizgeftê û li cihê melayên selefî û deng xinzirî bang bide!”

Û ez dikenim û ew na.

Dema ku xelkê bajarî radizan, em her du mîna zêrevanên sînoran hişyar diman, belê me bi xwe sînor li pey sînorî dibezand. Li destpêkê sohbeta me bi awayekî resmî bû, belê me xwe li ber negirt û li hember hez û xweriskên xwe ên har zû alaya spî hilda. Me bêriya hevdu fikir. Wek ku min gotî, me her şev diaxift lê me her roj hevdu

nedidît. Lewre, me tolên hevdiştinê li telefonê vedikir. Bêtir ji şevêkê me qeydên xwe şikandin û li ser baskên xweriskên xwe firîn heta ku gihane azadiyê.

- Lê Ewrûpî dibêjin laşê mirovî derewan nake!
- Ew rast dibêjin Narîn. Laşê mirovî derewan nake û ligel hindê mirovî bi xwe bawerî pê nîn e ji ber ku pûte pê nake.

Îslam mirovek pir nazik bû. Ewî dizanî çawan serederiyê bi jinê re bike dema ku li xwe mukir tê û dilê wê diçe seksê. Gelek şevan min telefon kiriye di berê xwe de, di nava nivînan de, destikê telefonê, car dibû destê wî û cestê min dipexand, car jî dibû lêva wî û ez hemû dialîstim û carên din...

- Carên din dibû çi? Ma qey tu şerm dikî?
- Na...

Ez ji hesretan de digeriyam û li dawiyê digeriyam. Min nifir li civak û kultur û yasayê dikirin ji ber ku agah ji agirê ku berbûye min, nebûn. Çend şevên havînê ez nîv sax û nîv mirî dipexivim, nîv ter û nîv zuha di nava nivînan xwe de dimirim; dişikestim û her tişt di çavê min de dişikest.

\* \* \*

Heta dawiya havînê, ango nêzikî sê mehan, em li ser wê rewşê berdewam bûn, bi roj du kesên pêgihayî û hevguncayî û bi şev jî du dizên sade.

- Ê paşî?
- Paşî, li şevêkê ji şevên çiriya yekê wexta Îslamî telefona min kir, bi hevokek -dîsan- seyr peywendiya me bi dawî hat.
- Berî niha te got ku Îslamî bi hevokek seyr destpêka dîroka te bi xwe re nivîsî?
- Erê, min wiha got.

- Û niha tu dibêjî ku eynî kesî bi hevokek seyr dawiya wê dîrokê jî nivîsî?

- Erê Narîn, bawer bike. Seyr e ne wilo? Belê, ji bîr neke ku zeman bi xwe jî seyr e. Ne abrûyên xwe bilind bike û ne jî bigihîne hev. Hizira mirovê tehemûla hemû tiştan dike...

Li şeva dawiyê, bi rêka telefonê, tu nemabû ku ez bigihim orgazmê. Min xwest ew ji pêşiyê ve bê min da ku hest bi mêyîtiya xwe bikim, her wisa da agirê min jî vemirîne. Got tu hêj keçî û a baş ew e ku ez ji paşiyê ve bêm te. Min diviya wî têbigihînim ku daxwaza min cuda ye, belê xuya bû ku daxwaza wî jî cuda bû, lew xwe xelet têgihand. Rast e negot: “Tu qehpik î û kes te ji xwe re nabe”, ne got jî “Tu qeyrekeç î û mayî bi ser guhê xwedanan de”, belê got: “Tu hez dikî ku ez ji pêşiyê ve bêm te, da tu ji keçîniyê bikevî û li dawiyê bi ser min de bimînî.”

Tu bawer dikî mirovek komunîst wiha bibêje Narînê?

- Min hay ji te heye Meryema min. Lê mixabin kesê ku mirov jê hez bike bi wî awayi hizir bike.

- Ez dibêjim wî nedizanî ez bi xwe ji keçîniyê hatime xistin. Ji hîngê de ez pirsyarê ji xwe dikim... Naxwe heger bizanîba wê çi bigota min? Evîn tenê beşek e ji hebûna zîlam î, lê hebûna jinê hemû ye. Îslamê Komunîst ew jî nedizanî.

Mela

Li zîvistana wê salê hemûyê ez veder bûbûm. Min pêwîstî bi bêhnvedanek dirêj hebû, dûrî mirovan, dûrî civatan, dûrî wan cihên ku min Îslam lê dîtî. Rast e ku hindêk caran bîranîn xweş in, belê mirovî diazirînin.

Wek carên din, ez ketim di xelwetgeha xwe de. Lê vê carê min sebrê xwe bi kevalên kevn diîna. Min biryar da, ku ez pêşangehek

Meryemayî , taybet û kesatî, ji bo xwe bi tenê vekim, belê çawan?  
Û ev bajar e wek sîxurgehê ye, tu tişt lê nayê veşartin.

Min nexwest -wek her car- lafîtekê amade bikin û li ser binivîsin “Bi çavdêriya filan an bêvan kesî”, min nexwest jî tu kes bi tirxan amade be û bi minet deftera mêvanan îmza bike. Min nexwest jî mecbûr bibim û keval bi keval bo hemû mêvanan şirove bikim, çavek wan li kevalî û çavê din li sîng û baqên min, bi derew serê xwe li min bihejînin, ango em têdigihin. Min nexwest jî kesên kalevaj xwe bi şarezayî bînin der û li ser kîsê hindê kesên bêdeng, hindê pirsyarên dubarekirî bikin. Belê min xwest ez bi tenê bim ji ber ku di trajediya xwe de jî her dem ez bi tenê bûm.

Narînê, carekê ji caran li pêşangehek hevpar bi çend hunermendan re, kesatiyek berpîrs li vê Duhokê beranber kevalek min rawestiya û got: “Ma şîmendîfer li Kurdistanê hene heya ku tu nîgar bikî?”, min nizanî mebesta wî kîjan Kurdistan bû, Kurdistan a me hejaran ku di dilên me de ye, an Kurdistanê hindê berpîrsan ku di cizdankên wan de ye?

Carek din, ciwamêrek din –qaşo rewşenbîr e- pirsyar kir, got: “Kevalên te pir in ji reşbîniyê, êdî hewl bide geşbîn be ji ber ku jiyan gelek xweş e û hêj zû ye ji bo te.”

Li bal min gelek seyr bû ku miriyek behsa xweşiya jiyanê bike, an bibêje kesê beranberî xwe hêj zû ye ji bo te. Te digot qey temen li ser eniya mirovî nivîsiye û kesên wek wî şarezaya dikarin bixwînin. Ez aciz nebûm, belê bi xwe re pê keniyam, ji ber ku heger wî xewn bidîtana, bawerî bi guherîna heba û jiyan kiriba wiha nedigot.

Li dawiyê min niyeta xwe anî ku pêşangehê li cihek taybet nîmayiş bikim. Tu dizanî li kû Narîn? Bawer nakim tu kesî pê zanibe çunkî di medyayê de nehatibû ragihandin.

- Li ku Meryema?

- Li odeya min a biçûk û bi şev... Nîva şevê.

Erê. Min kevalên xwe hemû bi rêz kirin, ji êkemîn keval heta ku gihame kevalê “Dûkêla şîmendîferê” û kevalê “Sêva sor bi dara rût ve” her wisa kevalê berî dawiyê “Semyan”.

- Ango, tê kevalek din jî nîgar bikî û hew?

- Ez wisa hest dikim tevî ku dixwazim berdewam nîgar bikim, ji ber ku bi saya hunerê û van kevalan ez -heta niha- nanê saxan dixwim. Ka em bizivirin sohbeta xwe a berî niha...

- Kerem bike, ez guhdar im.

Ez çûm bazara qumaşî, ne ji bo ku pirsyara dawî modêlên cilan bo destek kiras û fîstanan bikim, lê ji bo ku tobkek xeznê ku miriyan pê kafen dikin, bo kevalên xwe bikirim. Bi roj, min her kevalek bi parçek xezneyî dinixumand da ku toz negire. Bi şev jî min dihilêvirî û şemalkek li nişûv vêdixist. Bo sê rojan, pêşangeh a min berdewam bû. Bi rojê wek goristanek spî xuya dikir û bi şevê wek memleketek spî li ser ewran, ku tenê di efsanên selefîyan de mirov dibihîse.

Mirov, mar, derz, sêv, kêlên serên miriyan û dûkêla şîmendîferê, hemû bi ruh diketin, xwe ji nav parçên xezneyî diavêtin û li oda min diçûn û dihatin.

Narînê, her yek ji ewan bûbû hevalek... Heval nema û bo min neaxivî, û heval nema û ez jê re neaxivîm. Di wan hûrdeman de min hest dikir ku ez “Înana” an “Anahîta” me, belê piştî ku dengê xirecira Mencolê bi Kajînê re ji mezela din hatî, hîngê min zanî ku ez hêj Meryema me... Meryemaya bêîqbal û ne kesek din.

\* \* \*

Ji Çiriya yekê sala 1996’an heta Tîrmeha sala 2002’an, dîsan ez bi tenê Mam. Vê carê min ji dil hewl da xwe biparêzim û êdî nekevim telha tu bûnewerên nêr di vê daristanê de. Heta radeyekê min şiya.

Belê te rastî bivê, bibihurîne, piştî ku min Îslam naskirî gotina “Rastî” kete ser devê min, min îzayek mezin kişand ji ber ku ez jin im û hunermend im, nikarim bêşq bijîm. Wek hunermend ez dikarim ji gelek tiştan hez bikim ji ber ku huner bi xwe hezkirin e. Belê wek jin? Ji bîr neke can, nebûna zilamî di jiyana jinê de hebûna wê kêm dike û rojgara wê dike çolistan.

- Belê kîjan zilam?

- Ez mexseda te fam dikim. Belê li vî welatî hemû zilam zilam in, û hemû jin jî jin in.

Hemû wekhev têne mehrekirin. Ez wisa nahizirînim, belê nikarim jî wê hizirê ji serê gelek kesan bikim der. Pîvanên zilamtî û jiniyê hêj ji formî û pêşîrê derbas nebûne Narîn. Hindek caran ez dibêjim ku gelek ji hizirên xerab li nik xelkê me, ligel salgarê bûne wek endamên fîzîkî, pêwîstî bi neştergeriyekê hene. An na?

- Rast e ku ew hizir seqet in, belê bi neştergeriyê xwedanên wan bi xwe jî wê seqet bibin?

- Xuya ye ku ew jî rast e.

\* \* \*

Bi her hal, Duhok parêzgeh e û têra xwe heye. Lê ji ber bîranînên min bi her du zilaman re, Hejarê Pêşmerge û Îslamê Komunîst, Duhok li ber min bûbû qebristan. Min hest bi havîbûnê dikir, ji ruhê xwe zivêr dibûm, tenê li serayên ku roj bo rojê dirêjtir dibin, min dizanî ez hejmarek im, wekî din ez ne di tu hîsabatan de bûm. Rewşa min a aborî riswa bûbû. Ji xeyrî firotina hindek kevalan, tu dahatek wisa nebû ku ez xwe pê xwedî bikim. Ji mecbûrî min xwe fêrî nivîsînê kir, her heyamekê min çend gotar dinivîsîn ji bo ku padaştê wan werbigirim. Gelek caran min eynî gotarê li bêtir ji cihekê belave dikir. Nivîsîn ne karê min bû. Belê wek ku tu dizanî, li



vî bajarî pisporî tune ye, nivîsîn jî wek gelek tiştên din beredayî ye, bûye karê bêkaran.

Ez amade bûm xwe fêrî gelek karên din jî bikim wek duryarê tenê da ku mihtacî nemerdan nebim. Ez dibêjim ku mirovê hunermend heger bike dilê xwe, tu karê bivê, wê serketinê bi dest ve bîne, ji ber ku dîtinek panoramayî heye û rehendên hizir û fantaziya wî ji a xelkên din cuda ne, ji ber ku jî hestyar e û awayên serederiya wî bi tiştan re taybet in.

Bi saya duryarê min hevnasîn bi hindêk keçkên taxa me û taxên din re çêkir û paşî bi hindêk dîplomatîka ku min bo xwe ji berpirsyaran girtî, min karî hindêk dostan bo xwe çêbikim. Di wan pênc şeş salan de rewşa min a aborî li ser piyên xwe sekinî. Bo heyamekê ez dûrî hunerê ketim ji ber ku temayê li min da, min diviya serketina xwe, ne tenê di hunerê de, lê di bazirganiyê jî de, biselmînim.

Vê carê min bi hişmendiyane reftar kir û hizira projeyek serbixwe kir. Narîn, min têra xwe hejarî û mehrûmî dît, bavê min hate berçavê min, vêca dem bû ku ez rewşa xwe -bi kêmî ji aliyê aborî ve- hindêkê dabîn bikim. An te nêrînek din heye? Heger hebe bibêje!

- Na can im. Ew bi xwe normal e. Mafek sade û rewa ye, ku mirov hewl bide xweseriya xwe ava bike û paşî biparêze.

- Min jî wisa hizir kir...

Çima karê duryarê nebe dahatek serekî? Çima ez hewl nedim bo Mencolê û Kabirayî û hindêk kesên din biselmînim, ku bêyî wan jî ez dikarim berdewam bibim? Tu car ji bîra min naçe dema ku min xwe dihavêt ber darê dergoşa birakê xwe Kovanî ji bo ku Mencol bo dariçînê riyalekê bide min... Ji bîra min naçe wexta ku li nexweşxaneyê Azadî min behavêtî, heqê taksiyê di berîka min de

nebû ez pê bizivirim malê... Û gelek bûyerên din, ku keval jî tehemûla wan nakin, hez nakim vegêrim.

Baweriya min bi tuxmê zilaman şêlî bû, belê ji projeyan jî zilam gerek in nemaze di civakek nêr de. Min nedizanî çî bikim an çî bêjim heta ku min “Şeyma” nas kir. Şeyma keçkek nestêle ye. Hîngê, li her cejn û helketinê dihate cem min ji bo ku xeml û xêza wê durist bikim. Ji malbatek zengîn bû belê destvekirî jî bû. Ligel rojgarê em bûn du heval û car car li derve digihan hevdu. Pêwîstiya wê bi hevaleke wek min hebû, da ku têr guhdariya wê bike dema diaxive. Şeyma wek rûbarek penigî bû, di her kêlîkekê de berhev bû bi ser xwe de biherike.

- A niha ew li ku ye û çu kar dike?

- Ji mêja min ew nedîtiye. Dibe li Duhokê be û dibe jî na. Ez nizanim bi esehî, dûr nîn e ku şû kiribe, a naxwe bawer nakim tu karan bike çunkî keça yekane ye û bi hukmê jiyana arîstokrat, zû bi zû malbat rêkê nade ew hevaliya her kesî bike.

Dawî ku Şeyma bi min ve hate girêdan, min hizira projeyê xwe di ber re avêt û têgihand, ku baştirîn çareserî ji bo azadbûna wê -wek jin- kar e. Lê karek serbixwe, ji ber ku heger jin ji aliyê aborî ve serbixwe bû hîngê gelek tişt dikarin bên guhertin. Wek ku min dixwest, ne wek ku Şeymayê dixwest, malbata wê proje pejirand. Birayê wê “Hecî Hawar” biryar da ku bi samanê xwe û keda karê dikanê şîrîkatîyê bi min re bike, belê bi merc, ku ne ez û ne Şeyma li ber dikanê nesekinin ji ber ku xîreta wî qebûl nake. Ez qayil bûm, lê Şeymayê bêtir dixwest, belê bi dest nediket. Li nîva bazarê me dikanek bi şîrîkatî girt û du keçên xwedan ezmûn tê de damezrandin, “Meha” û “Rîma.” Ewan kar dikir û min û Şeymayê jî bi hev re pîlan û dîzayn amade dikirin.

- Bi xwe navê Şeymayê jî îslamî ye!
- Erê. Malbata wê tev wiha ye.

Lê gerek e bibêjim, ku keçkek behî bû, temenê wê tenê bîst û pênc sal bû. Dêmê wê wek berfê bû belê bi dersokê dinixumand. Malbata wê hemû îslamî bûn, hemû çûbûn Hecê, bavê wê “Hecî Hacî” û dayika wê “Hecî Rindê” û birayê wê “Hecî Hawar”.

Belê Şeyma cuda bû, ez dibêjim heger hez kiriba biçe, wê bo min bigota.

\* \* \*

Şeymayê ne tenê wek heval, belê wek xwişka xwe a mezin, serederî bi min re dikir. Di der barê her pirsekê de, wê nêrîn ji min dixwest. Min pê xweş bû, belê Hecî Hawarî pê ne xweş bû. Tu gava ez didîtim, berê xwe ji min werdigerand û bi hinceta destnimêjê nedihate destê min. Hestek li bal min dilivand, ku ez necis im. Bêtir ji carekê gotibû Şeymayê bila Meryema dersokê li serê xwe bike. Wî nedizanî ku Şeymayê bi xwe divê dersokê biavêje belê newêre. Wek rebeneka pêgîr, Şeymayê hest bi windabûnê dikir, tenê bi min re xwe didît.

“Xwişka Meryema, her ez nikarim te weku xwe lê bikim, vêca hema ez ê xwe weku te lê bikim” Şeymayê berdewam wiha ji min re digot.

- Û te çi jê re digot?
- Min digot: “Bila her kes ji me wek xwe be.”
- Di der barê dersokê de, te çi jê re digot?
- Min digot bibêje birayê xwe Meryema dibêje Xwedê kerîm e. Narê, heger hat û te xwest serederiyê bi kesên wisa re bikî, pêwîst e tu alavên serederiyê nas bikî û hilibijartinên xwe jî destnîşan bikî. Bi tenê bi kesên wisa re, tu nikarî di hilibijartin û derbirînên xwe de azad bî, tu nikarî bi pîvanên dorhêlî re rastgo bî. Kesên bawerdar

wek Hecî Hawar, li her dem û cihê hez dikin navê Xwedê û Pêxemberan bînin û selewatan li ser bidin.

“Xwedê kerîm e, Xwedê hez bike û Xwedê ji te razî be” van gotinên ku ligel demê bûne zarav di ferhenga rojane de, bandoreke erênî li ser derûna bawerdaran heye û wiha dikin ku ew pêşwext hizir û bîrên kesekî bi qencî binirxînin. Lewre jî, her ji destpêkê min biryar da bi kar bînim bi taybetî dema ku bi Hecî Hawar re diaxivim.

- Belê bi wî awayê serederiyê mirov wek xwe namîne, mecbûr e biguncîne. An na?

- Çêdibe. Lê ji bîr neke, min got bi bawerdaran re û piraniya mirovên vê serdemê gumandar in.

Narînê, li zemanê me, bi zehmet kes wek xwe bimîne. Li Ewrûpa wek tu dizanî, kes mecbûr nîn e biguncîne, heta radeyek mezin pêdawîstên kesatî dabînkirî ne, her kes wek xwe ye û xelkê rêz jê re heye. Belê li vê derê, li Rojhilatê, xelkê hîngê rêz bo te heye dema ku tu ew bî ê ku xelkê bivê, ne ew bî ê ku te bi xwe bivê.

Ev xelke çî qas hejar e eha ew qas seyr e jî.

\* \* \*

Hecî Hawar xortekî hêja bû, belê heta radeyekê dogmakar bû. Ne ji ber ku îltîzam bi kîtab û sunetê dikir û tizbî û darisîwak bi kar diîna, belê ji ber ku dixwest her tiştê ku di kîtab û sunnetê de hatiye, di dorhêlê rojane de, peyrew bike bêyî ku cih, zeman û guherînê, ku rastiya rasteqîne, li ber çavan bigire. Digot govend û dîlan guneh in, û ew civata ku navê Xwedê û Pêxemberan tê de nebe, civatek heram e, nefret lê be. Gelek tiştên din jî digotin êdî li gor demê naguncin, belê kesê dera xwe nedidît bersîva wî bide an bi kêmî hindek pirsyaran araste bike.

Hecî Hawarî dizanî ka ew çî dike û çî ji vê dinyayê divê wek ku wî bi xwe ji min re digot. Berdewam digot ku ev dinya pûç û betal e,

mirov tenê mêvanek e û dawî cend salan wê ber bi cîhana rasteqîne bide rê. Mebesta wî “Dar Al - Axîre” ye ewa gaveke din me behs dikir. Min dixwest ez hindekê behsa felsefa Platon jê re bikim ji ber ku bi hûrayi li ser wê mijarê nivîsiye, belê ez dudil dibûm çunkî ditirsiyam ne ku xelet têbigihe.

Li gor nêrîna min û te, çêdibe heta radeyekê ew fundamentalîst be, belê li gor nêrîna gelek kes din, ew nimûne ye bo mirovê qenc li hemû serdeman. Rast e, ku wî rîhên xwe berdidan, lê paqij bû. Bejn û bal û sîmayên wî bêqam spehî bûn. Zilamek zirav û dirêj, porreş û dêmspî bû. Koleja şerî’etê tamam kiriye, belê nedixwest bê damezrandin ji ber ku li cihê bavê xwe Hecî Hacî karûbarên bazirganiyê bi rê ve dibirin. Ji mêj de dixwest jinê bîne, lê wek ku Şeymayê digot, a bi dilê xwe nedidît.

- Ê paşî?

- Paşî a bi dilê xwe dît.

Di berdewamiya têkiliyê de em bêtir nêzikî hevdu bûn. Gelek êvaran li dû daxwaza wî, ez û Şeyma ligel diçûn geriyane. Şeymayê bi mebest hewl dida me bi tenê bihêle. Ez dibêjim wî ew dixwest ji ber ku mantelîteya wî hatibû guhertin û êdî dihate destê min. Min hest dikir ez ligel lawekî me, belê wextê ku kesek pêrgî wî dihat û digot Hecî hawar, yekhevw hestê min pîr dibû, min neynik ji çantê xwe derdixist û li dêmê xwe tê de dinihêrî, bêhemdî xwe ez dikeniyam.

\* \* \*

Min diviya demên geriyane wek delîve bi kar bînim û xweristek rasteqîne di der barê kesatiya xwe de -dûrî zaravên rojane- bidim wî, ji bo ku bêtir min nas bike. Belê mixabin, li her carê weku bûnewerek a mê serederî bi min re dikir. Te digot qey ew “Adem”e û ez jî “Hawa” me, ji perasiya wî hatime afirandin. Paşî, piştî ku

Şeymayê bo min aşkera kir, ku kêfa wî ji min re tê û berdewam pirsyara rewşa min dike, ez ê bizanim ka çima wî bi niyaz dixwest wan hizirên seyr û hestên pîr derbasî min bike.

Ewî dizanî ku ez nimêjan nakim, rojiyan nagirim, tu ferzên din jî eda nakim, tenê li ser nasnameyê misilman im, lê baweriyek reha bi xwe û karînên xwe hebû, li her carê digote min: “Heger Xwedê hez bike tê hemî ferzên xwe eda bikî.”

Min viyaba min ê hewl bidaya ferzan bikim, belê xuya ye ku min nediviya. Xwedê negotiye min nimêj û rojiyan neke, lewre jî bawer nakim ku ew bibêje min bike. Ma Xwedê gotibû Mehemdê Meyrê here Meryemayê ji keçîniyê bixe?

\* \* \*

Çend roj bihurîn û dîsan min viya qeydê jinê bi kar bînim. Ez mihtac bûm hestên xwe taqî bikim, her wisa delîvê bidim wî da ku ew jî hestên xwe nas bike. Çima pirsyara min ji Şeymayê dike dema ku ez bêpêjn dimînim? Erê ji min xerîb dibe, an hizira min dike, ji min ditirse? An jî ji xweha xwe ditirse ji ber ku wî tiştek der barê rabirdûya min bihîstiye?

Ji bo ku ez li îstgeha nû car din bi tenê nemînim, pêwîst bû hindêk pirsyaran bi xwe re bibim. Dawî çend rojên xelwetgehê, ez çûm dikanê da êdî ew li min negere, min tu alavên têkiliyê di navbera xwe û wî de nehêlabûn. Çawan ewî ez dîtim, viya xwe biavêje hembêza min belê min biryar dabû ku ez bi sarî pêşwaziya wî bikim ji bo ku reaksiyona wî bizanim.

Di heyama xelwetgehê de, şûna ku ez bêm guhertin, ew bi xwe hatibû guhertin. Wek tu ji vî destî bikî di destê din de. Êdî sohbeta ku me yê bikira, ewî hevdengiya xwe derdibirî û digot: “Xebera te ye”, min bigota sor e, wî digot sor e. Min bigota reş e, wî digot reş e û...hwd!

Hecî hawar bûbû xwedan etîkêt û perestîj. Her şev wek ferzê, ewî telefona min dikir û bi saetan ez diaxaftim. Li derve jî, li demên geriyanê, milê xwe bi ê min ve dihişt, diviya bala rêbaran bikişîne. Li restorantê jî berî ku ew rûne xwarê, cihê kursîka min xweş dikir. Rastî, ewî qedrê xwe digirt. Belê li ser hîsaba hest û sawêra min ji ber ku ez li ser niyeta xwe bûm. Ez li bin siya dara helhelokê radiketim. Belê min nedizanî ku ew ê zû gumanên min hişyar bike bi taybetî di der barê ol û ayinî û mexseda hebûnê de. Min dihizirand ku ew ji min hez dike lewre hatiye guhertin. Revdên hiziran ji serê min difirîn belê li asîmanê bawerdariya wî diqerimîn, wek teyrên masiyan serserkî dihatin xwarê. Wî diviya bibe xwedawendek nû, ademîzadek li gor kêfa xwe ji min -ne ji heriyê-biafirîne, mirinê bide min û zindîbûnê bo xwe bihêle. Ez bibim erd, ew bibe asîman, belê ruh?

Ez ji vegêran û guhdariya çîrok û çîvanokan westiyabûm, ên wek: yeksanî, wekhevî, geriyan li pey zîndîbûnê û zewaca bêtir ji carekê, belê ewî hewl dida bi awayek din dubare bike.

Min guman dikir ku ew guneha min, bi qurban û rojî û nimêjan bixefirîne û delîva pêdeçûn û çaksaziyê bide min. Kî nabêje ew bi xwe wê rojekê min siza bide?

Bi pirsyarek sade û rewa, ji bo mebest, min gumana xwe bi yeqîna wî pîva, min got: “Hecî Hawar, guneh li cem min ew e, dema ku kesek bêrêziyê li kesk din dike. Lê guneh li cem te çi ye?”

Wî bi awayekî jixwerazî bersîva min da, got: “Meryema, guneh li nik min ew e ku kesek zinayê bike.”

Mihemedê Mêhdî

Dawî însiyatîva min bo wî helwestê ku bi nêrîna min wêrek û wê biryara ku xuya ye çarenivîsî bû, Hecî Hawar heyamekê nexweş

dibe. Gelek li ber xwe dikeve, ê ku nizanibûya wê bigota kêmika heyvê ew girtiye. Roj bo rojê ewî li kêmê dida. Min bi xwe ew nedît, lê Şeymayê bi rêka telefonê qala rewşa wî bo min dikir, ka çawan deh rojan ew li xestexanê nivandin, ne dixwar û ne jî vedixwar, belê ji ber diaxivî. Di kêlîkên xilmaşbûnê de Xwedê û Pêxember û zikrî û selewat ji bîr kiribûn, tenê navê min tîna.

Tu kesî bi êşa wî nedizanî, ne hekîm û luqman, ne şêx û mela. Min û wî û Şeymayê bi tenê dizanî ku ez “Meryema” derd û dermana wî me.

Barekî giran e, ku kesek ji bo kesek din bibe derd û derman. Min hilnebijartibû ku ez bo wî bibim derd û derman, lewre jî min hest bi nerehetiyê nedikir. Belê min dikarî hilbijêrim, an bi kêmî xwe têbigihînim, ku Hecî Hawar ne derd û dermanê min e. Dilê min bi ewî dişewtî û li gor prensîp û wijdanê min diviya tişteki jê re bikim, belê hindêk caran prensîp û wijdan li hember dil û hestan lawaz dibin.

Narîne, mirov dikare aqilê xwe, hez û xwerskên xwe disîplîne bike, belê derewan dike ê ku bibêje ez dikarim dil û hestên xwe zêft bikim.

- Dilê mirovî ne milkê mirovî ye. Li welatên Îskandinavî wiha dibêjin.

- Rast dibêjin. Dil û hestên mirovî azad in. Belê li vê xaka ku bi xwînê avis, li şûna ku dil û hest mirovî azad bikin, mixabin mirov wan dîl dike.

Ligel Hecî Hawarî wan her duyan ez azad kirim. Ez ji helwest û biryara xwe piştrast bûm, ku ew mirov bi kêrî min nayê, an ez bi kêrî wî nayê. Belê çawa be, bihevrejîyan wê çetin be ji ber ku em du pêkhate û bûnewerên cuda ne.



Ji Tîrmeha 1983'an heya Tîrmeha 2005'an, ji nû ez giham azadiya xwe. Ne gelek in ma ne we ye?

- Na. Bi taybetî heger mirov li Rojhilatê bijî.
- Ez dibêjim li her derê can im, rast e ku Rojhilat kambax e, lê rewşa cîhanê tev tê guhertin.

Di wan salên dijwar de min karî ez Meryemaya mirov ava bikim tevî ku dem bo demê diherifiya. Rast e, ku ez birîndar im û birîna min sarêj nabe, belê ez şanaziyê pê dibim. Ma qey çi ye, heger mirov di cengê man û nemanê de birîndar bibe? Wek ku tu pê dizanî "Cengên cîhanê, cenga sar, cenga kendavî, ê yekê û operasyonên enfalan" hemû bi dawî hatin, belê cenga min bi bermayên kulturê pîs re hêj berdewam e. Ez hez dikim bo Mencolê û Kabirayî û hersê siwarên bê beyreq li ber dergehê kelha Meryemayê, biselmînim, ku wan mirin hilbijart, lê min jiyan hilbijart.

\* \* \*

Hecî Hawar çû. Pîlan û projeyên dahatî jî pê re çûn. Bi rûqayîmî ez ji dikanê xilas kirim û bo xwe bi tenê hişt. Min dil tê hebû ku şîrkatiya me berdewam bibe ji ber ku dahatê wê bi xêr û bêr bû. Min digote xwe, heger neqediya, wî çaxî ez ê para wî jî bo xwe rakim û dikanê bihêlim di dest Meha û Rîma ê de ji ber ku ji wan çêtir nabînim, belê wisa diyar bû ku Hecî Hawarî diviya tola xwe li min veke digel ku Şeymayê hewl dida bo wî pate bike. Ez li ber hatim, min para xwe firot, belê min li ser bihayê wê muzayede nekir ji ber ku te dixwest kî bikire.

Du mehan, ango heta meha Gulanê ez bêked û kesp mam. Gelek hizir di serê min de bûn, wek: zêrên xwe -bazin û gustîlan- bifiroşim û ligel bihayê dikanê taksiyekê pê bikirim û bo min kar bike, belê digotin taksî baş e heger di dest xwedanê wê bi xwe de be. Taksî

çênebû, bazirganî jî çênabe ji ber ku ez mê me û çênabe bi tenê herim “Dubey”an “Çînê.”

Nexwe, ez xweliya kê bi serê xwe werkim?

Ez tirsiyam ku diravê min xilas bibe îcar filsê sor li min bibe Fetah Paşa. Ew bû heta ku tu hatî û hizira Ewrûpa xwe li serê min da. Lewre jî li destpêka şevbuhêrkê min ji te re got: “Hêj sedema vegera te ji bo welatî nizanim!”

Min dizanî Ewrûpa ne hêsan e bi taybetî ji bo kesek a hunermend an keçik, ku kesê xwe li wê derê nebe. Belê li vê derê jî zehmet e Narîn. Min kesê xwe nemaye, tenê Kovan û Kajîn, belê ew jî bi xwendina xwe ve mijûl in. Ma çi ji wan tê? Di ser halê min re, dilê min bi wan dişewite ji ber ku li ber destê Mencolê mezin dibin.

\* \* \*

Ez ketim di gêjenga hiziran de. Biçim Ewrûpa an na? Yekem car bû ku ez ji cografyayê bitirsim. A tu bawer dikî, ez ji gelek tiştan tirsiyame û hîna ditirsim, wek bêkarî, zilam, jinbav û hejarî.

Li wê derê bêkarî tune ye, jinbab tune ye, hejarî tune ye, tenê zilam hene. Belê ew jî bûne robot, bi şev û roj kar dikin, ne wek ên vêderê ne ku simbêlan badin û perdeyan bipîvin. Ewan bawerî bi ronahiyê heye, ne bi tariyê û perdeyan.

Ez giham baweriyê ku ne tenê kesê min, belê êdî cihê min jî li vî welatî nemaye. Madem ku her ez biyanî me û wek biyanî serederiyê bi min re dikin bi taybetî regezê din, hema bila li welatek din, li nav xelkek din bibim biyanî û salên temenê xwe ê mayî dûr biqedînim. Min niyeta xwe anî û ji kerkî ve berheviyên xwe kirin. Berî ku ez kel û pel û hindek kevalên xwe bifiroşim, ez çûme borsê û min pirsyara pasportekê û tedbîrên seferê kir. Li borsa Duhokê min gelek dîmen dîtî û gelek deng bihîstin belê kê çare hebûn. Biraderekê li borsê ez nas kirim û got ku ew ji hunera min hez dike û tu pêşangeha ku

ez tê de beşdar dibûm, ewî kevalek min ji bo xwe dikirî. Kêfa wî bo min hat û xwest alîkariya min bike. Min têgihand ku ez tu ji borsê û fendên wê nizamim û ez ê spasdara wî bim heger karê min ji bo min bi serhev ve bîne.

Navê wî biraderî “Bêkes” bû. Ew ne rojnameger bû belê bi hukmê ezmûna xwe di wan meseleyan de, mîna rojnamegerekî pirsyar ji min dikirin: “Meryema xan, çima tu dixwazî herî Ewrûpayê?”

Min jî wek bergunehek ji xwe piştrast, got: “Ji ber ku ne tu tenê Bêkes î.”

Bêkesî ji min re got ku çûna min hêsan e, belê bi tenê du tişt gerek in û divê em peyde bikin, pasportek nû û zilamekî balix, da ku bi min re ji Kurdistanê derkeve. Paşî bi awayekî bisteh bişirî, xwest çirayekî di tariya min de vêxe, got: “Xeman nexwe, bihêle bi hêviya min ve!” Her kesî digot: “Bihêle bi hêviya Xwedê ve” belê bêkesî got: “Bihêle bi hêviya min ve.”

\* \* \*

Dawî çend rojan Bêkes telefonî min dike û dibêje ku mesele bi serhev ve hat: zilam û pasport her du peyde bûn. Ez xwedana xwe û peredanê me, a din hemû xema wan e.

Kêfa min hat. Li bayê bezê ez çûm bazarê ji bo ku hindek wêneyên rengîn bigirim. Bi rê ve, dihate berçavê min ku ez li cadeyên paytextên Ewrûpa mîna Stockholm û Amsterdamê digirim. Ez gelek bi lez bûm, bêtir ji fotografekê min dît belê ez jê dibihurîm ji ber ku qerebalix bû. Li dawiyê ez giham fotografekê ji nû dikana xwe vedikir. Xuya ye ku ew çûbû firavînê û ji qencbextiya min zû zivirî.

Piştî silavê, ew bi xêrhatina min dike û bi girnijînek sivik, kêman tu li ser dêmê zilamên vî bajarî dibînî, dibêje: “Kerem bike xanima hêja, derbas bibe studyoyê. Berî ku ez sûretê te bigirim, ji bo cara dawiyê neynikê bi kar bîne.”

Studyoya wî gelek spehî bû, bêhnfireh bû. Belê dema ku ez rûniştim ser kursîkê, bêhna min teng bû tevî ku ji kursîka îdamê an a hukmî cuda ye. Ew jî wek kursîka helaqî ye, ne milkê tu kesî ye, her roj kesek li ser rûdine belê sîmayên xwe li pey xwe dihêle.

Sê tiştên min ne durist bûn, makyaj, yaxa çakêt û tenberîk. Bîstekê ez li ber neynikê rawestiyam bêyî ku ew zivêr bibe. Min dixwest ew zû sûretên min bigire da ku li min nebe dereng, belê piştî ku ez rûniştim êdî min nedixwest rabim. Livîn û nêrînên wênegirî bala min kişand. Xwe bi min ve matil dikir, her bêhnekê li min dizivirî û li gor çavikê kamerayê ez araste dikirim. Geh wê bigota: “Tenberîka te hatiye nav çavên te” geh jî wê bigota: “Ji kerema xwe bigirî” gehê din jî wê bigota: “Wisa berê xwe bide kamerayê her wek tu ji bo min sûretan digirî.”

Gotina wî a dawiyê ez a hunermend di cihê xwe de bizivandim. Rast e, kî ji bo ê din sûretan digire?

Berî ku amajê bi lepê xwe bike, da ez lê binihêrim, hindek wêneyên din bi dîwarên studyoyê ve çavên min ji kamerayê revandin û hemû jî reş û spî bûn. Yek ji ewan wêneyan wek kevalek hunerî bû... Wêneyê jinekê bû. Sîmayên wê wek ên min bûn, belê bi temenê xwe ez biçûktir xuya dibûm. Bi sêrebendiya jinê min pirsyarek avête ber: “Ew jin kî ye? Sîmayên wê ne xerîb in.”

Ez li benda bersîvê bûm, belê wî tiliya xwe dewisand û wêneyê min girt. Ew demek bû li benda derbirîna sîmayên min bû da ku bi şêwek xwezayane bikevin kamerayê. Te digot qey qiralgeh e, ne studyo ye. Wî destê min girt û li pêşiya min derket ber maseya hîsabê. Di wan kêlîkan de, hestek xemgîn li cem min peyde bû: min digot qey ez winda bûme û wî ez dîtîm. Ji min û xwe re şand du peyalên çayê. Îcar rahişte kîskekê şîn ê tarî, min nizanî ê çi ye, hindek tûtina

veçerandî jê anî der û cixareyek pêça, bi serê zimanê xwe şil kir, vêxist berî ku bibêje: “Çîroka wî kevalî dirêje... Ji dema çavxwarinê dirêjtir e.”

Wexta ku diaxivt, li her du çavên jinê dinihêrî û bi kujê lêvan digirniyî. Berî ku wêneyên min ziwa bike û bi min bide, wî jî pirsyarek -ez bawer nakim ku ji hemû kesî kiribe- avêt ber min, got: “Ev wêne ji bo pasportê ne?” Min jî bi hejandina serê xwe bersîva wî bi erênî da.

“Bo Ewrûpa ye?” Dîsan min bi kurtî, bersîv bi heman awayî da. Ewî dizanî ez naçim Ewrûpa ji bo xwendinê ji ber ku temenê min mezin e, dizanî jî tu daxwazname ji wê derê ji min re nehatine ji ber ku hêj bêpasport bûm. Negote min neçe Ewrûpa, belê got: “Ez pênc salan li Swêdê bûm. Li bajarê Upsala, min mafê penaberiyê jî wergirtibû, belê dîsan ez vegeyriyam Duhokê û...” Her du çavên wî bûne du hêlîn, sivyanok revde revde jê difirîn belê li ser çiq û takên min nedinişyan ji ber ku li ber pêlên bayê demê dihejiyan. Berî ku ez xatira xwe jê bixwazim û spasiyan araste bikim, berê xwe ji min wergirt, nizanim bi min re diaxivî an bi xwe re, dema gotî: “Ez vegeyriyam û ez ne poşman im. Tu dikarî bibêjî ku ez mirovek ûtopîk im. Xebat û leбата me hemû cureyek ji cureyên ûtopoyayê bû, lê me bawerî pê hebû, me tehemûla her tiştî fikir bo xatira wê baweriyê û dawiya wê. Belê îro, em hemû nikarin tehemûla kesek ûtopîk bikin. Eha ev e trajediya mirovî nexasim heger ew mirov Kurd be.”

\* \* \*

Narîna min, li şûna ku ez qesta borsê bikim û wêneyan bigihînim hevalê Bêkes, ez çûme malê û ketim di xelwetgeha xwe a caran de. Wê şevê hemûyê min li wêneyên xwe dinêrî û hûrayên studyoyê dihatin bîra min, bi taybetî kevalê wê jina ku bûye pirsyar. Ne min navê wênegir dizanî, ne jî min telefona wî hebû. Ez çûme ber

neynikê û min berê xwe da sîmayên xwe. Nizanim çawa ew jin hat berçavê min. Ew heyamek bû min neynik ji bîr kiribû digel ku li spêdan, berî ku derkevim, ez nîv saetê li ber radiwestim. Her spêde li wê nîv saetê min li por, çav û makyaja xwe dinihêrî belê wê şevê min li xwe dinihêrî. Ez kî me, ew jin kî ye, ewa di neynikê de kî ye û wênegir kî ye?

Min nedizanî ku nimreya telefona studyoyê li ser zerfê wêneyan ê spî heye. Navê studyoyê Studyo Cîhan û nimreya telefonê her du li ser xitmê hebûn. Li spêda roja din -ne yekê Tîrmehê belê sî û yekê Tîrmeha 2005'an bû- bi hinceta spasîyê min telefonî wî kir. Ji deng û selîqa wî a wek helbestvanan min zanî ew e û ne tu kes din e. Ez pê dihisiyam ku ew bi tenê li studyoyê ye ji ber ku bi dilê xwe diaxivî. Peyvek ji min û yek ji wî heya ku sohbet germ bû. Ewî got ku sohbet me bi dawî nehatiye belê dem kurt bû! Min jî bi nazelînî jê re got ku ez ê bihême çayek din vexwim belê bi şertekî ku tu kevalê wê jinê bo min kopî bikî!

Heta ku ez giham studyoyê ewî şertê min bi cih anîbû jî. Di nav parçek qumaş de pêçabû, bîra wî kevalê ku min bo Hejarê Pêşmerge nîgar kiribû, li bîra min anî.

Min çay vedixwar û di ber re guhdariya çîroka wê jinê fikir. Mîna romannivîsekî, girîngî bi hûrayîyan dida. Wisa behsê wê fikir, te digot qey ew jin bi rastî bi me re amade ye. Car li xeml û xêza min dinihêrî, car jî li cadeya tijî mirov û tirêmbêl berî ku dest bi sohbet xwe bike û bibêje:

“Navê min Kirmanc e, dibêjin min Kirmancê kamîrê. Ji ber ku kamera her dem bi milê min ve ye. Di sala 1995'an de, meha Tîrmehê, bi eshî ez çûme Ewrûpa. Ji Tirkiyeyê bigire heya ku digihî Swêdê min dît. Dawî ku ez gihame Swêdê bi çend mehan, min mafê

penaberiye wergirt. Ez bûme xwedan xanî û ratib û hindek mafên din, ku kêfa gelek ji penaberan jê re tê, belê ew maf her kêma dimînin ji ber ku penaber bi xwe biyanî dimîne. Bêtir ji bajarek Swêdî ez hewandim belê min hest dikir ku ez akinciyek neviyayî me. Rast e ku bi gotin nabêjin te: “Me serê te nave.” Belê bi awir û kiryar rojê hezar caran wiha dibêjin. Wek ku min got, min bêtir ji bajarekî dît û min cêriband belê her fêde nekir. Xweristê havîbûnê bêhemd ez ji Swêdiyan veder dikirim heta ku ji xwe jî havî bûm. Min hewl dida zimanê wan fêr bibim belê di vî temenê dereng de mirov nikare fêrî her tiştî bibe. Min dixwest hunera sînemayê bixwînim, lê dîsan mesela temenî bûbû asteng. Li Ewrûpa emrê mezin problem e, bela serê xwedanî ye, ne tenê ji bo xwendinê, belê bo karî û têkiliyan bi taybetî bi regezê din re. Dema ku dibû şev, ji nû min hest bi hebûn û hevbûna xwe dikir, ku ez mirovek im û dem hogir e, belê cih ji min direviyan. Li Swêdî, ne tenê tiştên derveyi min wek seqa û cih dihatin guherîn, belê tiştên di nav min de jî ber bi guherînê diçûn. Li xerîbiyê mirov bêhemda xwe dibuhije. Meryema xan, guherîn baş e ji bo zarok û sinêlan, belê ne ji bo mirovekê, ku ji çil saliyê bihuriye.”

Narê, ji destpêka têkiliya min bi Kirmancê kamîrê re û heya dawiyê, carekê tenê jî negot ZILAM, belê hertim peyva MIROV bi kar diîna. Ew berdewam dibe û çîroka vegera xwe ji bo Kurdistanê ji min re vedigere, ka çawan daxwaza vegeerê ji dezgehên peywendîdar dike û wan sersam dihêle ji ber ku zû bi zû tu kes wê daxwazê nake, heger mecbûr nebe. Belê ewî rastiya hest û helwesta xwe digote wan, ku dem dema wî ye, belê cih ne cihê wî ye. Dibe ku cihê kesek din be, belê ewî girtibe. Berî ku bizivire, rojnamek Swêdî a bajarvaniya Stokholmê hevpeyvînekê pê re saz dike û pirsyara

sedemên vegeerê jê dike, ew dibêje: “Swêd welatek ciwan û paqij e, mafê piraniya Swêdiyan heye ku şanaziyê pê bibin. Mafê kesên wek min jî heye ku êrehiyê pê bibin. Rastî ez mihtacî welatek wek Swêdê me, welatê maf û mirovan, belê Swêd ne mihtacî min e... welatek din heye jê re dibêjinê KURDISTAN ji Swêdê bêtir mihtacî min e û lazim e ez bêhelwest nemînim.”

Di Tîrmeha 1995’an çû Ewrûpa û di Tîrmeha 2000’î de zivirî Kurdistanê. Xuya ye ku meha Tîrmehê ne tenê jiyana min wergerandiye, belê a gelek kesên din jî bê ku pê li cur’eta xwe bikin û behs bikin.

Ji ber ku rizqê wî li ser studyoyê bû, min nedixwest ez gelek di nav de biçim. Belê ewî jî nedixwest seredana min li malê bike da ku Mencolê nearîne. Berî hîngê min çîroka xwe û Mencolê jê re gotibû. Heya dawîn radeyê hevsozê min bû. Tu dikarî bibêjî ku dilê wî kete min. Dilê min jî kete wî û çendî ku min tiştê nû di der barê jiyana wî de bizaniba, ez bêtir pêve dihatim girêdan. Li destpêkê ez dudil bûm, gelo rastiya xwe jê re kifîş bikim an na? Ji ber ku li vî bajarê, ku heya bi dar û beran jî bûne hevalên hikumatê, tu tişt nayê veşartin û helbet wê rojek bê û ewê rastiye bizane. Lê belê xwesteka min ji bo jiyane û dîtina cîhana wî mîhdervaniya derewa min, an negotina min bo rastiye, dikir. Li tu dewr û zemanan min bawer nedikir, ku ez ê nîva xwe a din bibînim. Min hest dikir ku ez ew jin e me “Cîhan” û ew jî Mihemedê Mehdî ê rasteqîne ye ji bo min hatiye.

Çavên min ên ku wek du kanîkên çik, ser ji nû zan, ne êstir, belê jiyana diherikandin. Dilkê min ê ku bêtir ji carekê hatî çengokirin, rikeha xwe şikand û ber bi aso û keskesora caran firiya. Ez vegeeriyam cem Meryema a 1983’an, wexta ku hêj bavê min Dêwalî



û dayika min Helîma her du zindî, wexta ku hêj ez saxlem û bêderz. Min bêriya wê rojgarê dikir, bêriya keçîniya xwe a ku Mencilê sera wê ez li dîn û dinya şermezar kirim.

Li ewê heyamê min her tişt ji bîr kir. Derzên xwe, marên kore, dariçîn û... Semyan jî. Min dê û bavê xwe jî ji bîr kirin û êdî ne li pêncşemê ne jî li tu rojên din ez nedîçûm seredana wan li goristanê. Min hay ji tu tiştî nema ji ber ku ez pê dihisiyam ku emrê min dibihure û xwe li benda min nagire, ev dawî dangeh e ku ez tê de pêrgî çarenivîsa xwe têm.

Narîna min, tu îstgehên din nemabûn heya ku paşî ez lê bisekinim. Îstgeha dawiyê bû, ne şîmendîfer û ne musafir, tenê ez û ew, car car dibûn ew û ez.

Xwezî te ez bidîtama, te bigota qey berî hîngê min tu zilam nedîtine, min ji bîr kiribû ka tuxmê zilaman çi bi serê min de anî.

\* \* \*

Û sal wergera salê. Peywendiya me heya Tîrmeha sala din berdewam dibe. Salek tijî soz, eşq û romans. Em wek du aşiqên nûgihayî lê hatibûn, hez û xweriskên me li rasta sînorê maçê dihatin girtin. Gelek caran laşên me ji me direviyan û dixwestin hevdu bixwin, em her du tî û birçî bûn belê bi hînkatiya maç û henasan, bi bêhna xwêdana beden û hembêzan, me agirê hinavên xwe vedimirand.

Ewî wek parçeyek belorê, an kirîstalê, serederî bi min re dikir. Ew ditirsiya ku ez di destên wî de bişikê ew qas ez nazik û xweşik im wek ku wî bi xwe berdewam wiha digot.

Li Yekê Tîrmeha 2006'an, piştî ku ez ji hestên xwe ji bo wî piştrast dibim, her wisa ji hestên wî ji bo xwe, min bi têwerdan xwest pirsyara dawiya peywendiya me bikim ji ber ku gelek ji dawiyên bi guman im. Kezeba min ji rojek wisa diqetiya, ji kêlîka ku tê de

îstgeha dawiyê jî vala bibe û êdî çavên min li benda rêwiyekî bênavnîşan biqerimin. Belê min bivê an navê, ew roj di rojnamê de heye û wê bê, ew kêlîk wê helwest û biryarek nû bi xwe re bîne.

Çi qas roj û kêlîkên çûn, eha ew qas delîve ji me çûn Narînê. Dem dema lixwemukirhatinê bû, dema îtîrafê bû, dema lêborînê ji rojê û kêlîka demê û dahatûyê bû. Tu car wek wê rojê ez nedileriziyam ji ber ku tu car wek wê rojê min bihayê evîn û jiyane nedizanî. Gava ku min li dîmenê Kirmancî dinihêrî, çokên min sist dibûn. Dengê wî ê bor, porê wî a xelek, rîh û simbêlên wî ên kurt, mûyên destên wî ên reş û qelyonê wî tevan bi hev re digotin min: “Hişyar be Meryema, newebe tu rastiyê jê re bibêjî ji ber ku ew jî zilamek Rojhilatî ye wek Mihemedê Meyrê, Hejarê Pêşmerge, Îslamê Komunîst û Hawarê Îslamî. Li destpêkê û li dawiyê ew jî dîlê civaka xwe ye û nikare tu tişt ji bo te bike”, belê dema ku wî ji min re got: “Meryema min...” Wek sîmerxekê min baskên xwe davezilandin û xwe di roja dêmê wî de winda kir. Wê rojê, yekem car bû ez bibînim ku zilamek li cem min bigirî. Min her dem xwe dîtiye ku ez li cem zilaman digiriyam. Kirmanc têr giriya... Giriya zarokekê ji serman de. “Meryema min, ez ji te hez dikim, belê...” Wextê wî got belê, pişt li min şikest. Dengê derzên kevn û ên ku hêj neketine di ruhê min de, veda. Min nedixwest ew axaftina xwe berdewam bike, belê min dixwest her dem ji min hez bike. Min serê xwe çemand û ji nû zanî ka çi bi wî serî hatiye. Agirek ber bû li hinavên min, min niyaz anî ku ez xwe têwerbîkim û di hembêza xwe de wî bişewitînim, lê wî xwe di min werkir û ez vemirandim.

“Meryema min, ez bi hemû jan û jiyana xwe ji te hez dikim, ez te nas dikim. Hizir neke ku ez çîroka te bi temamî nizanim, na can im. Ez dizanim kîngê dayika te Helîmayê kirasê xwe guhert û kîngê bavê

te Dêwalî biryar da bigihewê û jinbaba te Mencilê bi tenê bihêle. Ez dizanim jî ka kingê Mihemedê Meyrê zilam kir sînonîmek bo heywanek dirinde, ez dizanim jî ka çawan her sê mucahidên din ji xezoyê destvala zivirîn. Di der barê te de, ez gelek tişt dizanim. Belê tu di der barê min de hêj tu tişt nizanî. A niha dem e ku tu jî têra xwe bizanî, tu hêja yî ku rastiyê bizanî. Ez nikarim te mehre bikim ji ber ku ez bi kêrî te nayê, ez...”

- Narîn!

- Belê Meryema!

- Ma tu dizanî çima Kirmancî nexwest min mehre bike? Ma tu dizanî çi ji min re got?

- Nexêr hey ez bi gorî!

- Got ez nikarim te mehre bikim, ji ber ku ez bi kêrî te nayê. Ez birîndar im, di şerê birakujiyê de fîşekek li nav lingên min ket û demara mêranyê qetandiye!

- Ez nemînim ji bo we û paşê Meryema?

- Paşê çi Narîn?

Dawî

\*\*

## MIJABAD

Roman

)Mirin zengilekî bêdenge, tenê yê ku mirina wî nêzîk be, ringîniyê dibihêze.

Ji roja ku ez bûme mêvanê Mehabad , ringînî ji guhê min neketiye

ez jî da ku li himber mirina xwe rawestim, dinivîsim. çiku tenê nivîsandin, zora mirinê dibe(.

Badînê Amêdî

Mehabad-sibat-1946.

2

Ev roman li ber çar çirayan tê xwendin

3

Çira yekem

Wisa melûl û bê ronahî, tu dibêjî qey ne çira ye

Zer e mîna mirinekê

Ez Badînim , bayekî dînim, giyanê min goleke kevizgirtî

ye, arîya sêkuçikên koçera ye ku li pey xwe dihêlin.

dorpêçkirî me bi xewnan, bi bîranînan û bi perçeyên

dilekî şikestî. Xefkên demê salên temenê min yê mîna

çivîkekî kor didin ber diranên xwe. Bi tenê me vê şevê

weke dareke miradan û rêwiyekî westiyayî.

Mirin êdî tê serdana min, ez bi pêjna wê ya giran dihesim

weke çawa piştî du peyalên meya giran serxweşî di

bedena min de digere, ma kê gotîye jiyan ne mey e û

mirin jî ne serxweşî ya wê ye!!

dizanim ku mirin bi hêz e, dizanim ku kes li derveyî

jiyaneke bi mirinê sînorkirî najî, lewra dixwazim jiyan

xwe ji bendên mirinê rizgar bikim, dixwazim bi

nivîsandinê hinekî mirina xwe dereng bixînim, hinekî di

rûpelan de bijîm, kî zora mirinê dibe? Nivîskar! Çi zora

mirinê dibe? zevîyên sipî yên ku hêdî hêdî tilûrên tîpan

ref bi ref li ser datînin.

Di odeyeke rût de ez ji dayik bûm, tenê tivingek û

Quranek bi ser serê min ve daleqandî hebûn.

Nîvê şevê derbas bûbû , stêrkan şerekî bêdeng bi tariyê re

dikirin , roniyekê xemgîn ji stêrkan diniquitî.

4

Pîrka min sond dixwar : Bi serê şêx Behadîn, te digot wê qiyamet rabe, dengê tivingan heta sibehê ji guhê me neket, kesî nizanibû ew deng ji ku tê?diya te Hamêst bi çavin lal li dîwarên rût dinihêrî, her kêlîkekê min kevçiyê şimarûnê digihande lêvên wê yên zuha, ji rehtiyan ne dişî lêvên xwe ji hev veke, peligên herdu çavên wê şîn bûbûn, bedena wê şebikî bû, ji jana zayinê rûyê Etles yê palgeha bin serê xwe dicût û bi dengêkî weke dengê yekî di binê bîreke ziwa de her digot: Yês gimêrnîmê. yês gimêrnîmê(ez dimrim, ez dimrim. (

Eniya wê ya zaferanî bi çipikên xwîdanê xemilî bû.

Wê katê bavê te li Derbendî Baziyan şer dikir.

Daye ya ji bêxewiyê gêj bûbû, ji nişkêve kire qêrîn:

mizgîna min li te neviyekî te çêbû!bi qêrîna mizgînê re stêrka sibê lerizî û di nav şewqa rojê de winda bû, diya te bi çavekî mişt hêsir li te nihêrî û bi dengêkî şikestî got:

Dixas(kurê min.(

Û xwîn herikî. . . . . ,

Daye ji dest hilanîn ket, doşek û palgeh di xwînê de man, rûyê diya te bûbû weke quşûfê, te kulmek zaferan tê bida wisa zer nedibû, çavên wê li te bû dema ruh jê kişiya. ew çi şev bû kurê min? wisa xemgîn weke ku şahî ji dunyayê reviya be. heftiyek neçû navika te ket, weke qetek werîsê qitinî bû, min ew di lûleya tivinga bidardakirî de danî, wê rojê falbêjeke şengalî hate mala me , min jê xwest ji te re falekê veke, pîra tasnêr li ber serê te rûnişt û carekê du caran kespikên xwe di destên xwe de li hev dan, rû kirin

erdê, li wan seh kir, qetek paçik ji pêçeka te birrî, ew bi diranan kire sê parçe û berda nava tasek av, du parçe dawerivîn jêr, yek bi ser avê ket, pişt re ew jî giha herdu qetan, pîra Şengalî ya Tasnêr di ber xwe de himehim kir pişt re berê xwe da min û got: wê ev kur ji dê û bavê xwe sêwî bimîne, qedere xwakê, ew jî li pey wane, di şeveke hîvçarde de wê ev kur xatirê xwe ji dunyayê

5

bixwaze, ne ez dibêjim, kespikin. weke tu min di ava berfê da bikî, ez lerizîm, hema beziyame navika te û ji lûleya tivingê derxist û xiste nav rûpelên Quranê. haya me ji kuştina bavê te nebû, dilê min di havîneke dojhê de bû komir.

+++

6

10 Sibat 1946 Mehabad

çavên min sed xefk li ber çivîkên xewê vedane, lê her ku çivîkek nêzîkî xefkekê dibe, bîranînek diteqe, wê difirîne, îro min çû çend kaxez kurrîn, min bêriya nivîsandinê kiriye, bila nebe derew min bêriya evîna xwe kiriye, ew evîna ku dilê min jê nayê şuştin. serma mîna derziyê di laşê min re diçe, sibehan dema ez li ser dengê sê keleşêran ji xew radibim, di xwe re nabînim herim dibistanê, lê Mujde! hemkara min, weke gerînekekê min dikişîne dibistanê, ew buhareke li ser du lingan dimeşe, dilê min germ dike, gelo ez jê hez dikim? nizanim, awirên wê, kenê wê, axaftina wê min vedijînin, weke bayê Metîn daristanên di giyanê min de bê deng mane dihejînin. vê

sibê gulek diyarî min kir, nizanim vê sibatê ev gul ji ku peyda kiriye, bi bînkirina wê gulê re Amêdyê tevde hate bîra min çiyayê Gara li Berwara jêr, Metîn, Rûbarê Amêdyê, Kela Aşb, Medresa Qebhan, darên berrûyan, keça meta min, hevdîtinên me yên di bin kulînan de, li bêriyê, di şikeftên nêzîk de, ramûsanên me yên germ û tirsok, pîrka min û keserên wê, rûniştina wê ya her sibe û êvar li bin dara tuyê, nifirên wê li Osmanî û Îngilîz û Tiyaîyan, bi hev re weke kunemozekê di xeyalê min de derbûn.

Nîvê şevê derbasbûye, qîreqîra sê dîkan ji Meydana çarçira tê, gelo çi tê bîra wan di vê şeva sar de?dêliya tirî ya ku weke xewneke rût di nîvê hewşê de, şaxên xwe ji ber ramûsanên bayê hov çep û rast dide alî.

)Mehabadî di xewnên xwe de, dîkên serjêkirî dibînin( nizanim çima bavê min vê şevê xwe li xeyalê min diqelibîne?çavên min bi wî neketibûn, lê her şev di hêsrên pîrka min re dihate mal, simêlên wî badayî, tivinga Martînî li mil, xwîneke weke şefeqê ji eniya wî diniquite, berê xwe dide min û dibêje: emê di birînekê de rastî hev werin!!

7

Ew sal herin û venegerin kurê min, pîrka min digot, kes ji seferberlikê venegerya, min jî destê xwe ji vegera bavê te bi heft avan şuştibû, lê. . .

Û pîrka min serpêhatiya bavê min digot.

+++

ez ji we tika dikim min bikujin.

Xortê Helebî ji hevalên xwe re got û nalînên xwe daqurtandin, ew li Sari Qamiş birîndar bûbû, topek li ber çepera wî teqiya bû, di destpêkê de nediêşiya, lê piştî wê meşa bê îman, birîna wî şîn bû, genî bû, gelek caran digot: xwezî min bi ya we nekiriba û ez nereviyama, niha wê tuxtorê Alman jehr di birîna min daba, ezê li ba rebbê xwebûma,

Ûnisê Amêdî û Remoyê Diyarbekrî li ber dilê wî didan lê birîna wî xedar bû.

Min bikujin. . ez ji we rica dikim!

Ûnis û Remo li hev nihêrîn, xwîn di rehê herduyan de hişk bû, li çavên xortê Helebî nihêrîn. . taxên teng, Sûka sergirtî, Saeta Babulferec, Azana camiya Zekerîya, stranên Heleb, di çavên wî de hêlan dikirin, bîna mirinê ji nalîna wî dihat

Dawîya meha Gulanê bû hîva ku weke kulorek nan dixewinî, roniyêke ji stranên çiyê hûnayî bi ser wan her sê firariyan de diniqutî, bîna berateyan difûriya, mirî li kenarê her rêyekê û di devê her şikeftekê de ramedayî bûn, Remo dest avête tivinga li ser milê Ûnis û bi dengê weke giriyê pîreke sed salî got: berê xwe biguhere Ûnis, çare nema

Meh diçûn û şer germ tir dibû, sînor li bin guhê hev diketin, weke pêlan artêş li artêşan dilikumîn.

Ûnis û Remo hêviyên xwe yên pêknehatî, bîranînên şikestina di şer de, dojecha wê roja sar li Sari Qamiş û

8

nalînên hevalê xwe yê Helebî li pey xwe dikişkişandin,



newal, şikeft, zuxurên nava çiyân, tariya şevê sitara wan  
bû, wan jî nizanibû çend meh yan çend rojan bi rê de man,  
lê Ji qudûm ketibûn, zerî zerhimî, jar, cilqetiyayî, dev û  
lêv çiriyayî, nêzîkî Diyarbekir dibûn, carekê Remo weke  
minalekî qêriya : eve Diyarbekir!!

Sûrekî reş, minareyin bejin zirav, û çemekî weke zendekî  
spî bajar dabû ber hemêza xwe.

Weke her maleke Diyarbekir, mala bavê Remo jî çend  
keçikên Ermeniyân hewandibûn, dema çavên Ênis li yekê  
ji wan ketin, di cî de hevalê wî yê şer Entranîk hate bîra  
wî, qelafetekî girs, rûyekî sorik, çena tûjik, çavên mêşinî.  
çend rojên ku Ênis li wir veşartî ma , çavên xwe ji keçikê  
nedibirrîn, di çavên wê de daristanek ji tirseke ne diyar  
xuyabû,

rojekê Ênis jê pirsî: tu bi xwedê kî tu ne qîza

Entranîkî? keçik di ciyê xwe de sar bû, nema zanibû çî  
bersivê bide, devê wê nîv vekirî bû ku tişteki bibêje lê  
Ênis fersend nedayê û got: bavê te Entranîk hevalê  
min bû, wî jî Sari Qamîş û dojecha wê dît, wî hişt ez firarî  
bibim, digot: misilmano, te bawerkiriye ev cihada  
gêwire? kuro gawirên mezin Osmanî ne, bazde bazde, ma  
morîkên diya te li vir qetiyane?

Dema Ênis ji Hamêst re got:

-Entranîk çû xwe teslîmî ûris kir!!

Weke ku mizgînekê bibihîze, rûyê Hamêst geş bû,  
daristanên di çavên wê de hişk bûbûn , li şopê , biharek  
koçerî konên xwe yên rengîn vegirtin.

Ênis û Remo nediwêrîn ji mal derkevin, temamiya wexta

xwe di zêrzmînê de dibihurandin û bi Dama dilîstin, bavê Remo rojê xeberek dianî, Osmanlî li firariyan digerin, her roj digot, yê ku wî bigrin wê mala wî li mîrata reş bigerînin, yan bikujin, yan careke dî vegerînin agirê şer, ku êdî fersenda revê nebîne, kesê wan dihewîne jî, teniyê 9

di rûyê wî didin, li ser kerekê paş û pê siwar dikin, kolan bi kolan digerînin, cezayekî pir jî jê distînin. Lê netirse kurê min Ênis, ez vê dibêjim ne ku ji mêvandariya te bêzar bûme, lê hay ji xwe bikin, dengê we neyê bihîstin heta xwedê fereca xêrê veke.

+++

Evîn ku tê, napirse gelo dibe mêvanê kîjan dilî, baraneke li çî erdî be dibare, pireke ji hêsr û hêviyan di navbera du dilan de, evîn agire bi pûşê dilan dikeve.

Di navbera dilê Ênis û Hamêst de jî evînê tevna xwe dirist, tevneke tayên wê di destpêkê de nediyar bûn, lê hêdî hêdî rengîn bû û bi neqşan xemilî, bavê Remo tê derxist ku herdu ji hev hez dikin, ji xwe Ênis ji Remo re dilê xwe li piştê vekiribû, bavê Remo rojekê got: Ênis kurê min, Hamêst weke keça mine, eger tu wê bi helalî dixwazî, ezê biçim Mele bînim bila mehra we bibirre, keçik jî disitire, tu jî bi serî dibî, tu bixwazî yekî kelekçî heye wê te û bûka te jî bi deh Reşadiyan bighîne Fişxabûrê, di Hekkarî re jî rê heye lê hinekî zore. eşqiyayên Tiyarîyan li wan deveran mane, rê ji ya çem êmintir nîne.

Hamêst ji kêfan re xwe nema girt, girêka desmala xwe

vekir û zêrek jê derxist û dirêjê bavê Remo kir, bavê Remo  
keniya û got: keça min, madam tu vî qasî jê hez dikî,  
bila kirêya we jî li min be, û qelenê te jî ezê bidim.  
Du salan Ênis û Hamêst li Amêdyê bê zarok man , xizmên  
Ênis digotin: ev jinik filleye, malzaroka wê ji dema  
fermana filleyan ve ziwa bûye, wê berde, jineke dî bîne,  
bila navê we li dinyayê bimîne. hinan jî digot: li  
Mûsilê hekîmên ingilîz hene, çî êş be derman dikin. diya  
Ênis jî bi kerb li wan vedigerand: hekîmiya gêwir ji  
me kême! çima Ênis naçe Bamernî?! şêx Behadînê  
Neqşebendî welîyekî xwedê ye, çendekî bila di gel  
10

Hamêst biçe xizmeta tekyeya wî bike, belkî xwedê bide  
xatirê şêx û kurekî bike qismeta wî!!  
Li Bamernî şêx ji nû ve mehra wan birrî, Ênis û Hamêst jî  
karê tekyeyê hemû dikirin, nanê mirîdan di rojên  
Tewccuhan de, alifê qantirên mala şêx, cotkirina zevî,  
çêrandina pez, avakirina xaniyên kelpîçî.  
Rojekê şêx ji Ênis re got: here welatê xwe, inşallah  
wê xwedê kurekî bide te, Amîn.  
Bi rê de herdu li dêrekê sekinîn, Hamêst derbasî dêrê bû,  
xwarî ser çogan bû li bin nigarê Meryem û kurê wê,  
mûmek vêxist û bi du hêsrên germ derket.

+++

kulavê Xurasanî, hibriyên Mûsilê, kilê Hicazê, kildanên  
Hindê, neynikên bûkan, tûtina Koysenceq, hevirmêş,  
xalîçeyên Helebçe, şalên Dihokî, malên baş û erzan.  
Dengê bazirganekî Mûsilî ku malê xwe di koşeyê

qeyseriya Amêdyê de raxistibû , bilind dibû, xelkê bi  
hesret û axîn li wan tiştan temaşe dikir, jin li ber  
radiwestiyan , texnekî diman û diçûn.

-ma ev ne karê dînane ? kes di tengahiya van salan de mal  
tîne Amêdyê!!

-Ji xwe re lê binêrin , nan tune em bixun, kulavên  
Xurasanî difiroşe!

-Bi xwedê jin a min bibîne, wê xalîçeyekê ji vî bazirganî  
bidize!!

-Ev casûsekî ingilîzane xwe xistiye kirasê bazirganan.

-Ezê hibriyeke Mûsilê ji Hamêst re bikirim , çend mehên  
wê mane zaroka wê çêbibe, ezê dilê wê bi vê hibriyê xweş  
bikim, Ênis nêzîkî bazirgan bû, hemyanê xwe vekir,  
hibriyek kirrî, û xiste paşila xwe.

-çima na , ma ne Ênise?ew dişêt Mûsilê tevde bikirre.  
Bazirganê Mûsilî weke wî nas bike jê pirsî: tu ne kurê  
mele Qadirî?

-belê çima?

11

-ez bavê te rehmetiyê mele Qadir baş dinasim, yê ku di  
zindanê de hevaltiya wî kirin pesnê mêraniya wî dikin,  
dibêjin: wî bi destê xwe werîs xiste stûyê xwe û got:  
ev werîsê xurt, imperatoriya riziya ji nemanê xelas nake.  
erê , bû pênc salên vê çîrokê, rehma xwedê li hemiyar be,  
ka niha çi dibe?dibêjin Silêmanî dikele!! raste?

-Erê dikele, şêx Mehmûd agir vêxistiye, ew karê xwe û  
serhildaneke mezin dike , ingilîz ji hukumdariya wî ne razî  
ne, major Son gelek gefan dide xwe, şêx jî dibêje:

hukmê gawiran tucar qebûl nakim.

Piştî du rojan, Ênis û dostekî xwe ji êla Koliyan, du tivingên Martînî peyda kirin , û karê xwe û çûna Silêmaniyê kirin.

Di şeveke reş de Ênis xatir ji diya xwe xwest, eniya Hamêsta bêdeng ramûsa û got: eger ez venegeryam û xwedê kurek da min, nav ê wî bikin Badîn. Eger keç be, çi navî lê dikin bikin.

Hamêst bi zikê xwe yê nepixî bi Ênis re heta ber devê derî rawestiya û got: Tartsîr şût.(zû vegere(

\*\*\*\*\*

lem niştimane da yan min yan ingilîz.

Bêtirî hezar şervanî ji êlên Caf û Pêşder û Belbas û Hemawend û Mukrî û Sindî û Mizûrî di talda her zinarekî de ji axaftina şêxê sî û sê salî re guhên xwe miç kiribûn. Hin bi tivingên xwe yên Mawzer hatibûn, hin bi Martînî, hinan jî Manlişerên xwe weke bûkekê dabûne ber hembêzên xwe, çavên Ênis bi şervanekî ketin, di cî de bazirganê Mûsilî hate bîra wî. nêzîkî lê kir û jê pirsî: kaka te bazirganî kiriye.?

-ha Ênis efendî tu yî?min zanîbû tê werî.

-tu yî?

-erê. lê ez ne bazirganbûm, ez peykê şêx bûm, min xwe gihande Kerkûk, Hewlêr, Zaxo, Dihok, û bajarokên dî, min dengê firefira vê alê digihande bajaran. û destê xwe

12

dirêjî aleke kesk kir, di nêvî de hîveke yekşevî sor hêlan dikir.

Ji wan herduyan ne dûr, şêx Mehmûd, li binê hîmekî rûniştibû, bi tiliyên xwe yên stûr simêlên xwe badidan, û li serê derbend dinihêrî, dilê wî li cih bû: tu hêz li dunyayê zora me nabin.

Ji her deverê alîkarî jêre hatibû, li Çemçemal Mihemed Cebârî serî hilda, Evdela Eskerî li Qela Sêwke, şêx Ehmed li Barzan, êlên Goyan li navçeya Zaxo, Hewramiyên li pişt sînor bi seroketiya Mehmûd xan Dizlî. di çend şerên biçûk de jî hêzên wî biserketibûn, êdî tirs weke xwê di dilê wan cengaweran de heliyabû.

şev gelekî bihurî bû, asimanê havînî bi stêrkên xweyên diçirisîn weke keriyek pezê Herkiyan li deşta Mûsilê xuya dikir, şêx nav di cengaweran dida û digot: birayewe, me guman dikir ku Ingilîz wê yarmetiyeke durust ji me re bikin, lê xuyaye ew dixwazin Kurdistaneke weke qutiya tûtînê ji me re çêbikin, wirde wirde cigareyên xwe jê bipêçin, rojê navçe yan gundekî ji me didizin, belê min sond xwariye:

yakeştî Kurd ebeme sahilî necat  
ya rûhî xom û alî pêxember be pird ekem  
min kurdim û be Kurdî elêm: birayewe  
zillet nema seadetî Kurdan gerayewe.  
Û bû teqîna hezar û sêsed tivingî.

Berbanga hijdehê Hezîranê bû, ingilîz weke kunemoza ku agir pêkeve, harbûbûn, leşkerên Borma mîna pezkoviyan bi zinarên Derbendî Bazîyan ve hildiperikîn , Mişîr Heme Silêmanê Hemawend da bû pêşiya hêzeke ingilîzan û berî dabû kozika ku şêx Mehmûd tê de bi cih bûbû.

Ûnis di pişt hîmekî de, cigareyeke pêçayî di nav herdu  
lêvên wî yên ji tîna hişk bûbûn de bû, ketibû nêçîra  
pezkoviyan Borma, bi her gulleyekê re serbazek  
digindirand binê gelî, di nav teqîna gulleyan re, qêrîna  
13

minalekî kete guhên wî, gulleyekê rêya xwe naskir, berê  
xwe da wê singa pîrmû û di dil re bihurî, stêrka sibê weke  
dilê evîndareke fedyok dilerizî, Ûnis li hêla Amêdyê  
nihêrî, qêrîna minal zelaltir dibû, nîv kenek li ser lêvên wî  
şînhat û çavên xwe qurç kirin.

Tavilê roj hilat, lûtkeyên Qeredaxê wek rûyê jineke li ber  
zayîne zerbûbûn, hîn xwîn ji birînên kuştîyan diherikî,  
qutiya tûtîne ya Ûnis di xwîne de mabû, û dû ji tivingên di  
destên birîndaran de hildibû.

şêx Mehmûd xençera xwe ya serxwar ji kalên kişand û di  
ser agirê ku şêx Xerîb jê re vexistibû re bir û anî heta  
sincirand, birîna lingê xwe pê dax kir, termê çil û heşt  
kuştîyan li dor xwe rêzkerî dîtin, hêsiran di çavên wî de li  
ber xwe dan lê ne herikîn. kaptênê Ingilîz Bond û Mişîr  
Heme Silêmanê Hemawend di ser serê wî re sekinî bûn.  
-eve şêx Mehmûd, Mişîr got.

-I know that. Kaptên Bond got û bi destê êsîrê xwe girt,  
şêx li Mişîr nihêrî, devê xwe tijî peyv kir lê ne axivî.

\*\*\*\*\*

12Sibat 1946 mehabad  
Ewr strana baranê dibêjin  
Weke bîranînên salên mijokî  
Yên her ku dûrî me diçin , şêrîn tir dibin.

Bi evîndarî dibare, bi xurtî dibare, bêşerm dibare, ewrin û helbestên xwe yên hovane dirêjin rûpelên zevîyên tî, gelo çi tê bîra van ewran heta ku razên xwe tev de di guhên vî şarê xilmaş de dibêjin.?

Dara tirî ya ku berxew bûye, weke tagirtiyekî dilerize, dareke rût weke vê şeva min, dareke hişk weke vî giyanê min, dareke sêwî weke vî dilê min, dareke kin weke wan evînên min.

Ji vê sibehê de ev rêjne li yek haweyî dibare, êdî di pencereyê re ji bilî tayên baranê tişteke naxewine, bîranînên  
14

min bi tayên baranê re dibarin, feqetiya min li Ispîndarê, Bamernî, medreseya Mele Yehyayê Mizûrî, xwendina min li dibistanên Dihokê, Hewlêr, xwendina min li Mûsilê. dostê min Sadiq Behadîn dilketiyê keça Hewlêrî Xanzad, tevde vê êvarê weke pelên dareke tuyê ku bi ser ava goleke aram de hatibin xwar, têne bîra min.

Saleke dogehî bû, zindana Akreyê ji zindaniyan têr nedibû, ,şaban axa li Amêdyê ser kişand, xelkên Berwara bala, Doskî, Sindî, Kolî, li himber Ingilîz û dûvikên wan ku piraniya wan ji êlên Tiyarî, Baz, Cêlo, Tixûma bûn, rabûn. ji hemûyan bêtir Tiyariyan êrîş dibirin ser gundên kurdan, camî dişewitandin, kitêb dihavêtin bîrên mizgeftan, bi hezaran reviyên Hekarî, hinekan berê xwe dane Ormiye, ez wê hingê sê çar mehî bûm, malbata me jî berê xwe dane tekyexaneyê Bamernî, mal û milkê me tev talan bû, êdî xelkê xweziya xwe bi salên seferberligê dihanî.



Tiliyên min ji nivîsandinê hişk dibin, çavên min jî ji bêxewîyê kujûlî bûne, êdî rûyê Mujde li ser rûpelan resim dibe, weke qitikekê di zadê dilê min de diçêre ev keç, dema vê sibehê dest da min bû çivîkek û di asoyekî nediyar de firriya , germiya destan herikî nava xwîna min, gelo ez jê hez dikim ? hê jî ez nizanim.

Xwedêyo ev çiye? nayê bawerkirin, qetên werîsan dibarin!!

\*\*\*\*\*

15 Sibat 1946 Mehabad

-Te jî dît?

-Çi?

-Barana werîsan!!

-Tu hişyar bûyî?

-Mehabadî hemû hişyar bûn, temaşe dikirin. Mujde bersiv da û ji nişkê ve kire qêrîn: Badîn !! ev çi bi stûyê te hatiye?

15

Min destê xwe da stûyê xwe, şopa werîsekî ziravik diêşiya, min fam kir ku tiştê min duh dît ne xewn bû, dema ku min dît werîsek li stûyê min tê gerandin û zimanê min tê ku ji gewrîya min derkeve, min newêrî bû ez bûyerê jê re qise bikim, min got: min di xew de stûyê xwe gelekî xurandiye, neynûkên min jî dirêj bûne. û min pêçiyên xwe dirêj kirin, neynûkên min hemû qusandî bûn, Mujde keniya, sikura kirasê xwe hilda û got: binêre.

Ay xweda !!kê ev qirika nazik çelitandiye?

Min îro bala xwe dayê, xelk hemû qirikên xwe şanî hev

dikin, lê bûyer derbas bû bêyî ku kes wêribe eşkere  
bibêje.

\* \* \*

Mije, û mij xewna çiyaye, henasên zivistanê ye, razên ku  
şev di guhên sibehan de dibêje, cêwiyê baranê ye mij,  
pêçiyên ewraye li ser têlên Sîtara zivistanê, Mehabad jî  
weke keçeke tazî xwe bide ber sûlavekê, di nava mijê de  
ye, dibêjin Mehabad şarê mijê ye, MIJABAD e, ne tenê  
mija xwezayê, lê komara ku saz bûye bi xwe di nava  
mijeke sor de digevize.

Çirayên stûnên di serê her kolankê de, roniyêke nîvkuştî  
bi ser vê mijê de dibarînin, li ber xwe dide ronahî, li ber  
xwe didin çirayên stûnên serê kolanan.

Berî roj here ava li pişt çiyayê Lendî şêxan, ez û hevalê  
xwe Kerîmê Şikakî çûne çayxaneyê Las û Xezal, du  
xortên tenik li maseya nêzîk me rûniştibûn, yekî ji wan  
rojnameya KURDISTAN vedinêrî, min ji Kerîm pirsî:  
Ev xortê KURDISTAN di dest de kiye?

-Menafê Kerîmî ye, hevalê min yê Komeleyê bû, guman  
heye Pêşewa wî bike wezîrê perwerdehîyê. Min awirên  
xwe berdane stûyê Menaf, belê şûna tu werîsan ne  
xuyabû, Min ji Kerîm pirsî: eserê werîsan ne  
xuyaye?

-Werîsê çi?

16

-Ma te barana werîsan ne dît?

-Badîn çi bi te hatiye? te xewn dîtine , yan tu dîn bûyî!?

Min gotinên xwe daqurtandin, û bê axaftin stûyê xwe

raberî wî kir. Kerîm awireke sivik avête stûyê min û got:  
ev pêşiyên Mehabadin bi te vedane, çemê Sablaxê jêdera  
pêşiyane Badîn. Tu jî dizanî dema ba radiweste pês^hi har  
dibin. Kerîm rabû ser xwe û berê xwe da Menaf û jê re  
got: Xuda perestî ştêkî çak e!! Menaf jî weke wî lê  
vegerand û pirsî: kak Barzaniye? min destê xwe dirêj  
kir û got: ez Badînê Amêdî me, mamoste me.

-Be xêr hatî kak Badîn, fermo danîşe. û bi dilgermî destê  
min guvaşt?

-êwe çî vedixun?

-Eger çay nebe, çay. û em her sê kenîyan.

Xirecira çayxaneyê ne dihişt em dengên hev bibihîzin, ji  
dûyê cigareyan, mijêke ji ya îşev tîrtir çêbûbû, nizanim  
Menaf çî ji min re got, min serê xwe nêzîk kir û got:  
Mîrza Menaf, bibûre min dengê te nebihîst. Kerîm got:  
Kurd dengên hev nabihîzin.

-Bo?!Menaf pirsî.

-ji ber ku guhên xwe şîma kirine!min bersiv da.

-na welle, ji ber ku gewriya wan xetimiye. Kerîm bi hêrs  
got.

Em di wê guftûgoyê de bûn, dengêkî kal û lerizî kete  
guhê me:

-Derya , ne derya be komar hîçe.

Her kesekî di çayxaneyê de stûyê xwe bi alî dengê lerizî  
de zîvirand, şopa werîsan li ser her stûyekî zîvirî xuyabû,  
min ji Kerîm pirsî: ev kiye.?

-Ez Emîral Axa me, li ser raya xwe me, eger hûn  
Mehabad nebin kenarê deryayekî, yan deryayekî li vê

komarê saz nekin, ew diherife!

17

Kalekî lerr û zirav, satileke sifir di destê wî de, mase bi mase digeriya û ava di piyalên li ser maseyan de rû dikire satila xwe.

-Çemê Sablax têra keştiyên mezin nake, ji pêşewa re bibêjin: bê derya nabe. û ghişte ber maseya me, çavên xwe weke du xençeran di çavên min de çikandin û got:  
-Bêgane can, dezanî bo çî şêx Mehmûd be ser nekewt?  
şarî Silêmanî bender nebû, çiya hîçin. û bi hêrs piyala avê ji ber min rakir.

Heta mirdin, wekû bende le xizmet şahî Kurdistan  
Heyatî xoy fida ka bo hemû emrêk û fermanî.

Weke çemekî bi xumxum ji gramafona çayxaneyê diherikî ev stran.

-Elî Esxer Kurdistanî dizane helbestan hilbijêre! Kerîm got.

-Erê, ev helbesta Ehmed Muxtarê Caf jî mîna keke berçave. Menaf bersiv da.

-kak Menaf, tê bîra te dema em li cenazeyê wî hazir bûn?

-Ma ew roj ji bîr dibe Kerîm can!! me gora wî dikola, dema me sîtarek di bin axê de dît, me fikir û ne fikir ew sîtar dernediket. dawî me ew di gel sîtarê binax kir.

-Qadir Ewlay jî tarjenekî bê hempa bû, her dem li rex Elî Esxer bû, ew weke cêwiyan ji hev nediqetiyên.

-Badîn tu çî li ser Elî dizanî?

-dema ez li Silêmanî bûm, min her şev li dengê wî guhdar fikir, digotin wî li şirketa BEYZAFON çend stran tomar

kirine, carekê hatibû Silêmanî ji şêx Mehmûd re strabû.  
Le heq em bendeyî xoye bimênî lutfî caranî.

Min em hebsem le la fexre be şertî serwerî Kurdan

18

Me her sêyan li ber awazên vê stranê xatir ji hev xwest,  
dengê Azanê ji camiya Ebbas Axa bilind dibû, bi rê de ez  
dageriyame meyxaneyê Agop yê Ermenî, min şûşeyek  
VODKA stand, di nava mijê de dimeşiyam, gotinên  
Emîral Axa weke vê mijê ne gelekî diyar bûn, belê gelo  
ku Mehabad bi rastî benderek bûya wê rewş çawa bûya?  
Ez û te ne Mehabad

Ne xewa te tê

Ne jî jimartina stêrkên te diqede

Bîna Qerenfilan ji êvarên te yên şil tê

Bîna te ji Qerenfilan tê

Kolanên te, bi hêsrên serê sibehan tene pêçandin.

Te giriyê sibehan dîtiye Mehabad?

Gelo çi dibêje Sablax ji vê şeva lal re?

Hoo şarê xilmaş

Xewnên te di xelekên werîsan re derbas dibin.

Mij te radimûse, kolan bi kolan

Lûtke bi lûtke

Û dinale

Kî mija te ramûse?

Di pencereyê re li nalîna mija te guhdar dikim

Îşev. . .

Buhareke bi bîn û xwîna bayê seherê şûştî

Li dergehên te dide

Hoo komara sêwî  
Kê hûnane ji bo te ev jan?  
Kê rêsansê ji bo te ev şevên bêxewiyê?  
Kê di çavên te de Qerenfil û Darçîn çandine!?  
Kê di di bejna te de bihar serjêkirine?  
Kê tu dayî ber barana werîsan?  
Bîranînên min, di kolanên te de  
Weke berrûyên Amêdyê têne hêran  
Kolanên te min bêhiş dihavêjin her meydanê  
19

Xerîbim ez di van kolanên te de  
Mîna vê komarê di nava komaran de  
De biçine stêrkên bîranînên min bi dasên şevên bêxewiyê  
Giyanê min Bike xaliyek  
bila pêxwasên te  
Li ser bibûrin  
Giyanê mine ji xewnên bi mij hatiye ristin.  
Mija te ye ji giyanê min hatiye ristin

\*\*\*\*\*

Îşev min nas kir çima serbazên Rûs li Qafqasya, di şerê  
mezin de, tivingên xwe bi Vodka didan, tivingên wan  
mirov dikuştin, Vodka, derdan dikuje, Vodka bîranînan  
vedijîne, Vodka ji hêsrên xwedê çêbûye.  
Ev du qedehin ez vedixum, tu dibêjê qey mija Mehabad  
tevde di serê min de dîlanê dike, bîranînên min yên li  
Silêmaniyê, weke dînan bi kolanên xeyalê min ketine,  
hespin û hefsar ji siwar stendine û dibezin, weke çirayên  
di serê kolanên de diçirsin, Jale tê bîra min, lê dengê

pisîkên Mehabadê nahêle ez binivîsim, gelo çima pisîk vî  
qasî di Sibatê de dîn dibin?

Serê min ji çiyayê Metîn girantir bûye, mij, bîranîn,  
vodka, bi hev re weke pilingan di vî serê mest de nêçîrê  
dikin.

Min ev xewn dît:

)li şûna Lendî şêxan, deryayekî gewre, weke xaliyeke sor,  
li ber çavên min raxistî bû, Mehabadî bi hûr û girên xwe  
hatibûn pêrgîna wê keştiya ku li benderê rawestiya bû,  
qijikin efsaneyî li ser keştiyê hêlan dikirin, Pêşewa bi  
bejna xwe ya mîna pênûsekê, ber bi keştiyê ve diçû, pêlin  
sor û kefdar li çîmên Pêşewa ketin, dengê hat digot:  
kirasê xwe hilmale!Pêşewa guh lê nekir û da nav pêlan.  
ev xwîn, ji cilên min paktire! pêşewa bi nermî got û destê  
xwe dirêjî keştiya rawestiyayî kir, di keştiyê de gelek kes bi  
sêdaran ve daleqiyayî bûn, hin serjêkirî ramediyayî bûn,  
20

şêx, Mela, Begler, sêdareke bi werîsekî vala li nêva keştiyê  
danayî bû, Pêşewa berê xwe dayê, li ber rawestiya, werîs  
ramûsa, û daket. keştî bi rêket, wirde wirde biçûk bû heta  
di rûyê aso de bû xaleke reş. Mehabadiyan desmalên xwe  
liba kirin, keserên xwe weke refên qulingan bi dû keştiyê  
de firrandin( .

\* \* \*

Rojeke xweş bû, ji nêva biharê xwe vedizî bû, hatibû  
serdana vê Sibatoka sar. berf qeto qeto li serê çiyayên  
Xezayê, Qûlqulax, Daşa Mecîd, weke bîranînên min xuya  
dikirin, çend kulîlkên Helekokê di bin berfa bişaftî de serê

xwe hildabûn, mizgîniya biharê didan, nameyên bihareke  
zû bûn ew kulîlk.

Qutabiyên her dibistanekê mîna karikên ji çêrê vegerin bi  
lotik ji dergehên derdiketin, alên rengîn li ser banên malan  
bi bayê nermik re pêl didan, li dirêjahiya şeqamî şapûr û  
şeqamî Pehlewî tevgereke germ hebû:

Çayxane tijî ne, li dor maseyekê çend xort rûniştine,  
rojnameya KURDISTAN di dest yekî de ye, bi dengê  
bihîstî dixwîne,

-Menaf Kerîmî bûye wezîrî perwerdeyî!!

-Be xway gewre ew şayenî em mertebeye.

-Ho ho . . . kerîm Ehmedyanîş bûye be wezîr!!

-Boçî na ?Ew xizmî Mîna Xanime!

Bavekî bi destê kurê xwe girtiye û wî dibe berber, yek bi  
kurê xwe re derbasî ba terziyekî dibe, pîr kes di ber  
meyxaneyê Agop re derbas dibin, di bin çavan re li  
şûşeyên mişt şoreş û dînbûn dinêrin , rûyê xwe tirş dikin û  
dilezînin, siwarekî ji xwe razî di meydana çarçira re  
dibûre, qirpeqirpîq simên hespa wî, şal û şapikên wî,  
rêşiyên ji kolosê wî dawerivîne, simêlên wî yên badayî  
dibiriqînin, hemû dibêjin ev kurê axayekî ye, gundiyeke û  
kera xwe li şûşeyên meyxaneyê mêze dikin, yê gundî rûyê  
xwe diqermiçîne û lêvên xwe bi peyvin nediyar dilivîne,

21

na peyvên wî têne bihîstin, ew dibêje Estexfirullah,  
paniyên qelişî yên herdu lingên xwe di newqa kera reben  
ra dike, dêêêêêê û diçe. di tariya dikaneke biçûk de kalek  
li ber kokelên werîsan rûniştiye, ji banê dikanê her reng



werîs daleqandîne, zirav, qalind, stûr, kin, dirêj, zer, spî, ji  
Kêndirê, ji naylon, ji pembo, ji hiriyê jî hene werîs, hin jin  
li ber dîwarê xwe, di tava rojê de, berrên rengîn çêdikin, bi  
quloçên xezalan tayên rengareng di nav hev radikin, çend  
Barzanî tivingên wan li mil bi payedarî dimeşin, Jîpeke  
reng ji axê giran giran diherike, çend feqeyên rî sivik bi  
lez berê xwe didin camiya Bazar, diyare naxwazin nimêja  
Esir li wan here, keçikeke nûhatî li dîlana du perwaneyan  
sêr dike, çav li min û Mujde dikeve, pencereyê digire.

-Ev hemsaya mine.

-Kî?

-Ev keça ku niha pencere dada.

Bêyî ku Mujde çavên xwe ji pencereyê dagerîne, pirsî:

-xweşikê?

-Mujde te xweşikbûn ji kesî re nehiştiye.

-Te çima behsa wê kir?

-her sibe dengê strana wê tê min:

çendan ki guftem, xem ba tebîban

Derman nekerdend, miskîn xerîban

Mujde di ber xwe de, bi dengê nizm û awazeke xemgîn

ev xezela Hafizê şîrazî gihande dawî:

Hafiz negeştî şeydayê gêtî

Ger mîşinîdî pendî edîban.

Û hêsrin di çavên Mujde de biriqîn.

-Mujde çima digirî?

-Badîn, pişt re tê her tiştî fêr bibî!û serê xwe di sînga min

de bingor kir, min ramûsaneke lezok, weke birûskekê, ji

lêvên wê yên weke du libên tirî dizîn , û got emro behare!!

-lêre Mehabade Badîn, behareş le beharî şîraz xoştire.

-ca were em seyran bikeyn!

22

-be kû?

-Be lêwarekanî Sablax!

-de ka.

Em ji çavên xelkê dûr ketin, kes nizane bê çawa me xwe ji şarê Mehabadê vedizî, xelk xerîkî komara nû ava bûyî bûbûn, ez jî bi evîna xwe ya nû mijûl bûm.

-tu komara vî dilê wêranî Mujde!!

Ew li ber şorebiyekê rûnişt, xwe siparte qurmê wê, û bi dengê nazik got: were lam danîşe. ez li nik rûniştim û bêdeng min li ava çem nihêrî, ji min pirsî: xeyalet be kû seyran eka Badîn!?

-ha..... ez li ba te me, û min ew da ber pêlin ji ramûsan, ez bi nermî ji xwe dûr xistim û bi ken got: şerm bike mamoste.

-evîndar şermê nizane. Ê em hinekî bêdeng man. min ji nişkêve jê pirsî: eger Sablax derya bûya, wê Mehabad çawa bûya.?

-Te jî keştî dît?

-belê.

-tu tirsîyayî?

-ez ji xeleka werîsê vala tirsîyam.

-ewe pêşeroja vê komarê.

-te bersiva min neda!!

-bersiva çi?

-eger Mehabad benderek bûya?

-Ezê bi keştiyan çûbama Ararat.

min ew bersiv daleqandî hişt û pelek ji deftera di dest  
xwede qetand, gemiyek biçûk pê çêkir û berda avê, Mujde  
çend kevirên hûr bi dû wê gemiya aware de avêtin , çavên  
wê xwe bi hêsrana dişûşt, min destê wê yê weke  
çêlekewekê hilgirt û bi lez ramûsa(hemî ramûsan li vî  
bajarî wehane.)

Evîna veşarî êdî rûpoşa xwe dihavêt, herdu dil dibişkivîn,  
bêdeng cenga lêvan dest pêkir, şorebiyê şaxên xwe berjêr  
23

kiribûn, weke konekî kesk herdu veşartibûn, lêv li ser  
lêvan vediniştin, du êlên Koçerane bi hev ketine, talanê  
dest pê kir, tilî li serê memikan digeriyan, ji nav daristana  
por derketibûn, li nezarê gerdenê rawestiyan, li pişt  
nermik û navmilên şayik, singa zerî û germ seyran kirin,  
gulsêv ji henasên Mujde diweşiyan, memikên dest nedîtî  
weke keroşkên li pişt tûmikan serî hildidan, stûr dibûn, ax  
û ofên şehwetê herdu bedenên tî dihejandin, bi diranên  
xwe Badîn guharê Mujde jê kirin, bi du gezên sivik re ew  
mest kir, weke ewrên Nîsanê di ser hev re werdigeriyan, kê  
gotiye evîn ne taveke?!-ez ji te hez dikim, herduyan bi  
çavin nîvgirtî, ji hev re gotin, û dîsa ketin govenda  
hingivîn, har bûbûn herdu beden, dîn bûbûn zik û navran,  
ling û dest, lêv û diran, ziman û tilî. Mujde lêva xwe ya  
jêr hindik mabû biqetanda, ji xweşiya wê katê re qêriya û  
got: ûxeyç. Badînê tî dewla xwe berda binê bîrê, bi  
şikestina tîbûna xwe re (ofyaaan)ji devê wî weke nalîna  
birîndarekî derket, Mujde li rex wî di xewa şêrîn de bû,

bedena wê ya weke sûlavekê tazî di nav çipikên xwêdanê de dibiriqî(kî dikare sûlavan hembêz bike?)Badîn xwe li ser piştê kir, weke cotyarekî ji cot westiya be, destên xwe xistin bin serê xwe) û çavên xwe li odeyeke xir û xalî vekirin, ne Sablax hebû, ne Mujde, ne jî şorebiya dilovan. Nema zanibû di xewnê de ye, yan rastî bû.

\* \* \*

Dawiya Sibatê ye, êdî xweza kefenê zivistanê dirêse, berfeke har ji êvar de dibare, di cama pencereyê re li çirayên kolanan dinêrim, kuliyan berfê ronahî dorpêç kirine, weke hengên xwe bidin ser kulîlkên biharê, êrîşî wan çirayên xemgîn dikin, çira jî bi ronahiyên xwe yên nîvkuştî li ber xwe didin, gelo ev berf dikare wan vemirîne?!ji pencereya himber min dengê hemsaya min tê, strana xwe ya herşev dibêje:

24

Ya reb eman dê, ta bai bîned  
çeşmi muhibban, rûyê hebîban.

Van rojan li medreseyê, li çayxaneyê, li Serbazxanê, û li civatan behsa yarmetiyên Rûs dibe, berî du rojan pênc hezar metralyoz, tiving, û demaņeyên Gold û Birno gehiştin urdugeha Serbazxane, çekên giran hîn nehatine, Mehabadî dibêjin: pêncî tank û deh topên giran bi rê de ne, hin sond dixun: karwanekî leşkerî li nêzîk bajarê Xoy rawestiyaye, Emîral axa jî, kolan kolan digere, kenekî dîn dike û diqîre: derya wê Mehabad biparêze, ne hesinê sar ji dewletên qeşa yê.

Berf xurt tir dibe, peyta peyta şaxên dêlîya tirî, ya weke

jinbiyekê, di nîvê hewşê de, spî dibin.

-dar axaftinên zevî ne!

Kerîmê Şikakî dibêje.

gelek caran ez guhê xwe didim şaxên vê darê, dengê buhurîna avê di rehên wê de weke awazê sîtarekê tê, nalîna reza ji hewşa min tê.

-Xewa daran nayê!

Kerîmê Şikakî dibêje:

-Dema Simiko axa kuştin, nalîneke weke barebara karikên şîr ji darên Şino , Ormiye, Selmas, û Xoy hat, her kesî giryê spîndaran bihîst, hinar û sêvan wê salê ber negirtin, berû di darên xwe de teqyan, te hêsrên daran dîtine Badîn? berbangê here li ber darekê raweste, stranekê bibilîne, wê dar şaxên xwe dawerivîne, bergên wê weke çavên minalan şilbibin.

Berfê sond xwariye heta beyanê bibare, weke ku dilê zivistanê û barkirinê nebe bayê kurr dizûre, bayekî bi nalîn weke heyranokên dengbêjekî kor.

-ba gazinên çiyane, dema çiya giliyê tenêtiya xwe ji asoyan re dikin ba radibe, Kerîm weha dibêje, dema Simiko kuştin çiya bêdeng man, tenê lihev dinihêrîn û

25

digiryan, tenêtiya xwe ji bîr kiribûn, wê salê ba rawestiya bû.

Ji mehan meha Hezîranê bû, şanzdeh salan berê, ez deh salî bûm, bavê min di gel çend siwarî rişmên hespan bi Simiko axa re badan ser Şino.

-Rizaxan bi xwe li hêviya mine, Simiko simêlên xwe yên

reş û tûjik û bi donê berxikan biriqandî badan û ji siwaran re got.

dîrokê xefkên xwe yên zêrîn vedabûn, xefkên ku lê dilikumîn Kurd di katên nexwedayî de.

-Ezê bihêlim Rizaxan qelûna min tijî tûtin bike hîn ez ji hespa xwe daneketime, Simiko soz dida siwarên xwe, berî jivanê gulle bariyan , ji her alî de , Simiko destek avête xençerê, destek di paşila wî de ma, siwaran nizanibû çî diqewime, kesî jî nizanibû ew siwarên jidesthilanînkê çî birebirê dikin? tenê dengê dihat, digot: pergala me belav bû. du leşkerên Iranê hatin nava kuştîyan ku termê Simiko hilgirin, qelûnek zîvkirî vala di nav lepê wî yê bi xwîn de bû.

Keç û bûkên Şikakî li ser gora Simiko civiyan û bi keziyên xwe kêla serê wî veşartin, heta niha keçikên Şikakî kezîkurrin.

Kerîm piştî kuştina bavê xwe, bi destê diya xwe û Mujde girt û berî dane Mehabad, li girê Xudaperest bi Menaf re bû endamê(J.K.(

)di deryayekî pêldar de, û bi keştiyeke riziya mirov hêviya çî peravan dike? ew weke xewnan di nava pêlên aware re xuyadikin, peravin ji xewnên beravêtî, xewnî ji mija xeyalekî dîn û bê perav! çend caran xewn bi xelekên teng yên werîsên daleqandî hatin lorandin? ma xewn ne derewên şevê ne?

Sê salan berê ez: Badîn kurê Unisê Amêdî şervanek bûm li gel Mele Mistefa, dojehek bû ew şer, ji xwe di nava agir de hesin sîqal dibin weke çawa dil di evîneke xedar de

26

tenik dibin. min digot: emê karibin Bexdayê jî têxin zefta xwe, ne min tenê, lê wan darên êzingan hemûyan wa digotin, li gel wilo jî min zanî bû ev azadiya malmîrat ya ku deh hezar tivingên serxweş ji bo wê dilîrînin zû bi zû xêliyê ji ser rûyê xwe nade alî, min zanîbû hevîrê me hîn tirş nebûye me tenûr dadaye, min zanîbû ew qirşik dişewitin, lê tenê der û dor ronî dibin, hêviya min û nanekî taze bixum nebû, dîsa jî min bi dilgermî şer fikir, ji bo armancên mezin xebat rewaye, çendî mirov zanibe ew armanc pêk nayên jî. halê vê komarê jî ewe, ew daneyeke di tizbiya dirêj ya mêjûya me de, ez dizanim wê ew di nav tiliyên stûr yên çerxa felekê de birize, hûr bibe, bibe bîranîn, vaye du meh di ser re derbas nebûne, Rûs sozên xwe weke berûyan şikandin, ma dûre ku ew û Tehran bi yek desmalê dîlanê nakin?! hayê kê ji bayê felekê heye? ji ku tê û diçe ku.?

Bayê kurr tiliyên xwe dirêjî dêlîya tirî dike, wî kirasê berfê ji ser şaxên wê yên rût dişeqitîne, bi hovîtî wê tazî dike, zinê pê dike û dibe qêrîna wî bayê zinêkar(yek caran şoreş dibin ba.)

Sibe wê ekkasek (fotografçiyek) were dibistanê, ji bo kişandina wêneyên mamoste û qutabiyan.

\*\*\*\*\*

Xefkên dil

Erê.....yek caran dil kor dibin, di koncalên evînên nêçîrvan de werdibin.

1939Amêdyê

horiyên bihiştê jî ne di ciwaniya wê de bûn, min di hemêza wê de dilê xwe kedî fikir, giyanê min yê sar, hogirî germiya sînga wê bûbû, dapîra min hêlanek ji tejiyê kevin ji me re bi dara me ya tuyê ve girêda bû (tuyên wê spî bûn û şêrîn bûn) em ji hêlanê dernediketîn, li ber bayê hênîk yê esrên teng xilmaşiyê şêrîn digirte ser me.  
-Rabin rabin, tilûran bi ser we de zelq û zîç kirine.

27

Dapîra min em ji xew radikirin, em zarok bûn, me hîn nizanîbû jin û mêr çima yek caran bi hev re dikevin nav nivînan, nalîn bi wan dikeve, lê herdu bi kêf ji nav nivînên xwe derdikevin, me ev nizanîbû, lê agirekî nediyar xwe li dilê me weke lavlavekê pêçabû, rojekê -hinekê salên me bi jor de hilkişiyabûn- em di wê hêlana xwe de bûn, dapîra min li axurê bû çêleka xwe êm fikir, keça meta min weke qitikekê destê xwe dirêjî singa min kir, bişkokên şapika min ya Keldanî vekirin û hêdî hêdî qitik dakete jêr di bin piştanê min re li nav ranên min çêriya, tevizîneke xweş di bedena min geriya, ji wê rojê de min nas kir ez nêrim!  
Sal gindirîn, êdî lîstika me ya şêrîn û gewdeyên me yên tî nema di wê hêlanê hildihatîn, geh li kadînê, geh li axurê, bedenên me yên weke du sibehan xwe ji mija kincan dadiweşandin, her ku dem diçû keça meta min ciwantir dibû, li dû tavên nêraniya min, du Dobelan di singa wê de hilpekiyan, çi germ û nerm bûn ew herdu girên ji agir ku di berriya singa wê de bilind bûbûn, çavên wê qerfê xwe bi şevên biharê dikirin.  
-Pîrê ezê bizewicim.



-şukur ji xwedê re Badînê min bû zilam.

-Tu dizanî dergistiya min kiye?

-Xwedê tenê bi razên dilan zane bexê min.

-keça meta mine.

Pîrka min di ciyê xwe de bû kavilekî bédeng , hema destê xwe da ser devê xwe û got: porkurro, malmîrato ma ne ev xweha te ye, te û wê sal û nîvekê bi hev re şîr ji yek pêsîrê mêtîye.

Satilek ava berfê bi ser serê min dabû, bêçare mam, rencerû bûm, şêt bûm, aware bûm, lê min xwe ji wan katên xwedayî û ji evîna narewa veneçinî, min got eger ev hal rêxa çêlekên dapîra min be jî ezê têde bigevizim.

Rojekê dapîra min ez hinartim Dihokê.

28

-Bado ev çêlek jî weke min pîr bûye, ji rêxê pêve tişteki nade me, guhanên wê çikiyane, binêre....tu dikarî parsûyên wê bihejmêrî, wê bibe Dihokê belkî tu me jê xelas bikî, dibêjin bazirganên Mûsilê li wir sewalan dikirin û difiroşin Ingilîzan.

Min nizanibû dapîra qeder çi tevnê dirêse.

Serê payîzê bû, li kevîkên rûbaran, kêlekên rêyan, termê havînê ramediya bû, ez û çêleka pîr û du balafirên LANKISTER yên Ingilîzan tenê di wê payîza bi tenê de dimeşyan. bêtirî înekê ez mam, lê pol û poşman vegeyriyam.

-Te çêlek nefiro?

-şerekî giran dest pêkiriye.

-îşê çêleka min bi şerê xelkê çiyê?

-dibêjin wê ew berfireh bibe, wê êzing û ardû buha bibin, emê wê çaxê rêxa wê bifiroşin.

Nizanim çima dilê min di singa min de ne ditebitî, û xeyalê keça meta min ji ber çavê min xwe nedida alî, berêvar bû, ez li bin dara tuyê rûniştim, çivîkeke xemgîn, li ser şaxeke rût weke giyanê min yê wêran veniştî bû, min ji dapîra xwe pirsî: ka çivîkên vê darê? berê xwe da ezmanekî vala û got: lawo heywanên xwedê ne, dera jê hez bikin, lê dilûsin.

-û keça meta min?

Du hêsrên xwe di qelîşteken rûyê dapîra min de bi cih kirin û bi dengê ne weke dangan got: dîn bûye!

Mîna ku rehek di dilê min de biqete janekê xwe berda hinavên min, tehliya ku li ser zimanê min kom bûbû min daqurtand, dawerivî giyanê min ew tehlayî, û bêyî ku bipirsim: çima? ez derketim.

Pîrka min a bi dengê bilind digirîya go: ew li Bamernî ye, wê rihet bibe kurê min, lê kes nizane çi pê hat, şevê ji xew rabû û kire qêrîn, hema dipirsî bado te çi kir!!

29

Min zanî bû ku êdî çare nemaye û ew jivanên me yên bi dizî ew li dînbûnê qelibandine.

Wê şeva payizî xewê rêya çavên min winda kir, Generalên artêşên Fransîz û Alman û Ingilîzan jî wê şevê çav nedane serhev, ez difikirîm çi bikim û berê xwe bidim kîjan bajarî? kîjan bajar min û birînên min hembêz bike! ew difikirîn kîjan bajarî têxin bin lingên xwe ! EZ generalê evîneke sêwî bûm wê şevê!!

Hêdî hêdî ezman zelal dibû, mîna xewnekê ji hev vedibû ezman, çivîkên ku li ser dara tuyê niviyabûn, rojeke nû pêşkêş dikirin, bêyî ku ez li hêviya hilbûna rojê bimînim, ji mal derketim, stêrik weke tuyan yeko yeko ji ezman dadiweşyan, ezman bû weke dareke bê meywe bi hilatina rojê re, min Amêdyê li pey xwe hişt, ew weke xewnekê ji ber çavê min winda dibû, bayê hênik yê ku gelî û newal dilorandin, tilûrên ku wê sibeha xemgîn hêlan dikirin, rûbarê serxweş, kenê keça meta min li bin darên berrûyan dema min ew didiqdîqand, siya zinarên efsaneyî, sûlafê ku ji gotina çîrokan têr nedibû, ew wêne û nigarên li ser kevirê newalan, li devê şikeftan, heft bîrên kevnare, kuna berfê ku heta havînan berf tê de ne diheliya, havîngeha mîrekên Behdînan, paytexta kepû bilind, darên spîndarê, badem û gwîzê, çiyayê Metîn, Gara, çêleka pîrka min, kitêbên min, Derên tozgirtî, zimanên cuda cuda ku li bin guhên hev diketin(Ibranî, Erebî, Siryanî, Tirkî, Kurmancî,( hemû li pey min man, ez generalê wê evîna qedexe!!tenê min birînên xwe, şikestinên xwe, û xewnên xwe yên pêknehatî bi dû xwe de dikişkişandin.

Min dixwest berê xwe bidim bamernî, lê lingên min berê min dane devereke dî.

+++++

dawiya payîzê, 1939.

Silêmanî weke dîzekê li ser agirê fikreke netewî dikeliya, hîn bîna barûdê ji zinarên Taslûce û Derbendî Baziyan

30

dihat, hîn xwîn şil bû li ser wan zinaran, axîna bavê min ya

di ber mirinê de bi bayê beyanê re dikewkibî, hîn xelkê digot:

-şêx Mehmûd ji vî çemî av vedixwar.

-Dema êsîr bû , ew anîne vê malê.

-eve ala wî ku li zendên xwe gerandibû.

-Ev tîp ji çapxaneyê şikefta Casine ne.

-Min jî rojnameya Bangî Heq dixwend.

-Pûlposteke memlekta wî li mala me heye!!

-Perîka bazekî ji bazên wî yên nêçîrê di berîka min de ye!!

Hinan jî digotin ku wan solên şêx li ber lingên wî rast dikirin.

Hevalê min Sadiq Amêdî, yê ku li wir mamoste bû gelek alîkarî bi min re kir, min xaniyek li navçeya bajêr kirê kir, ez li kar geriyam, bûme çayçî, zû ez ne dihatim qebûlkin, ez Behdîniyek li nav Soranan bûm, bavê min li vir xwîn rijand, min jî qedeh dişuştin!! ji maseyekê diçûme yeke dî, nûçeyên şer taze taze li çayxaneyan belav dibûn, di gramafonan re dengî qebe behsa şer dikirin.

rojekê li ser maseyekê du kesan çayeke şêrîn xwestin, bi zor di xirecirê de dengê wan dihate min, yekî bi awirin matmayî li min nihêrî û pirsî:

-Kak le kûyî?

-Ji Amêdyê me.

-Unisê Mizûrî dibe çî te?

-Bavê mine.

-Rehma xwedê li hestiyê wî be, ew mêrekî çê bû, te mûyek jê bernedaye.

-Tu ji ku wî nas dikî?

-Bîst salan berê ez çûme Amêdyê weke bazirganekî  
Mûsilî, wî hibriyek ji min kirî, li qeyseriya mezin, min  
tîpên mêrxasekî têde dît, jêre qala şêx Mehmûd kir, havîna  
wê salê min ew li Derbendî Baziyan dît, çiqas xwîna wî ya  
ku wê şefeqê rijiya sor bû.!!!

31

Wan salan kesî nediwêrî bû bawerîya xwe bi kesî bîne,  
casûs û sîxurên Almanan li her deverê hebûn, yê  
Ingilîzan jî bêtir bûn, casûsek bihata girtin, di zindanan de  
diriziya, tune jî dibûn, piraniya Kurdan alîgirê HITLER  
bûn, ji qehra Ingilîzan, ji Almanan hez dikirin.

-Navê min Sayib Hewlêrî ye, ev jî hevalê min Heme Reşîd  
e.

-Ez jî Badînê Amêdî me.

Me xwe bi hev da naskirin.

Tûtin di cixareyên xelkên rûniştî de dişewitî mîna bajar û  
gundên Ewropa, mîna dilê min. dû li ser wan serên tijî ji  
fîkr û xeyalên jihev dûr dizîzikî mîna xewnan, ez û wan  
her du xortan bûne dost, hevalê min Sadiqê Amêdî jî li wir  
mamosteyê ciyografya bû, lê me hevdu kêr didît, dema  
xelk li çayxaneyê kêr dibûn em rûdiniştin, me behsa  
Barzanî, şêx Mehmûd û şerê mezin dikir, tayekî ku  
morîkên tizbiya axaftinên me li pey hev rêz bike nebû, deh  
rojan pişt re, Heme Reşîd bi tenê hat, min bala xwe dayê  
çixareya di nav tiliyên wî de vemiriye, ziq li çaya ku li ber  
wî sar bûbû dinêrî,

-çi heye?

-Sayibê Hewlêrî girtin.

-kê!!?

-Ingilîzan!! ma kê li vî welatê bê xwedî mirovan digire!?  
berî tu werî vê çayxaneyê, em rûniştibûn, wî bêhemdî xwe  
xaçekî şikestî weke yê Nazîyan li ser maseyê kola, binêre.  
şopa xaçekî hebû , lê xuya bû bi kêrekê rakiribûn.

-Xweziya tankên Hitler îro werin vî bajarî, min bi hêrs got,  
û ber dilê Heme Reşîd da.

Ez li Silêmanî xerîb bûm, ji min nefret dikirin xelkê,  
zimanê min fêm nedikirin, digotine min: Badîniyo  
Kurmanco!! her kes li serê min bûbû Mîr Miheme Korê  
Rewandizî, lê Heme Reşîd ne weke wan bû , me ji hevdu  
fêm jî dikir, gelo ev xemgînê han kiye.?

32

-Ez ji Dêrsimê me bira, te ev nav bihîstiye? Derîyê zîv e lê  
teresan navê wê guherîne, kirine Tuncelî, binêre çawa zîv  
bi kêna xwe dikin tunc û sifr!! lê xwîna wê nehatiye  
guhertin, hîn bi ava desmêja Seyid Riza xelk sond dixun,  
hîn Henneya ku bûkan ji serê xwe re stra bû di kodikan de  
zuwa nebûye, berî du salan bû bira, Dêrsim sexweş bûbû,  
xwîne di tamarên xortên wê de dîlan dikir, çiyên hev ji  
xewa ezelî radikirin, dîrokê xefkên xwe veda bûn, lingên  
kor bi hezaran tê wer bûn, çi xefkin xweşik bûn bira, rêl û  
daristan, newal, dil û hinav, bi hev re sotin, agir bi çiyayê  
Dêrsimê ket, Elî şêr nas dikî bira? Rêber serê wî hilqetand  
weke ku zebeşekî ji lema wê hilke, serîyê bê gewde di bin  
çengê Rêber de, li ber maseya efserê Romî danî, dibêjin  
serê jêkirî -bawer bike- tif kire rûyê Rêber, ode tijî bû,  
çendî cihok çêkirin, ajotin çemê Munzur, hîç bû , nema

zanibûn xwe çawa ji wê tifê xilas kin, di bin tifê de fetisî Rêber. payîzeke şil bû berî du salan, baraneke hûr weke hestên Seyid Riza dibariya wê şeveqê, baranê werîsê rûn kirî şil ne fikir, wî serê xwe yê bê şaşik xiste xeleka werîs û:

-hêêêy çiyayên Dêrsim bi xatirê we.

-Oxira te ya xêrê be. çiyayên li hev vegerandin dengê birîndar. bejna Seyid Riza weke stûneke ji ronahiyê li babû.

Keçik û bûkên Dêrsimê porê xwe henne kiribûn: em serê xwe naşon heta Seyid Riza destûrê bide. lê wî destûr neda, bi sedan keç avêtin çemê Munzur, heta mehekê henneya bişaftî çem reş kiribû, desmalên bûkan li newalan weke qulingan bi bayê kur re mêl dibûn, wan desmalên bi henne, xwe li daran digerandin, tîş tîşî bûbûn ew desmal weke meyweyên buhurî, heta niha ku ba ji hêla Dêrsim tê bîna hennê difûre, navê min ne Heme Reşîde, ez Hisênê KANZADE me, dizanî kanzade çiyê bira?ez lawê xwînê me!min jî roja Xizirî sond xwar li ber destên Şahan axa yê

33

Bextiyar, me goştê qurbanê jî xwar û destê xwe di xwîna qurbanan da kir û di rûyê xwe da, ax bira ax, serhildanên me weke darên bin xwe tenê sî bikin, govendên koranin ew serhildan, xwedê jî nizane kê ew fêrî dîlana tewş kirine.!!

Min Hisênê Dêrsimî anî li ba xwe bi cih kir, odeya min tijî hilma henneyê bû, tijî girî bû.

-Tirk li min digerin, segên xwe berdane welatên xwedê,

şopa bîna henneyê diajon, min efserek û du serbazên wan kuştine. ez ji çiyar dadiketim, min dît xûşka min rût li bin dara hinarê, efserê tirk bi ser de xwar bûye, orîniya gayekî pîr jê dihat, nizanim çawa min tivinga serbazekî ji dest girt, ew û yê mayî li erdê sar kirin, xûşka min jî di xwîna xwe de ma bû. porê hennekirî bi xwînê hate şuştin!!

Her şev Hisên ji min re behsa Dêrsima xwe dikir, tozek henne li tûtina cigareyê dikir û dikişand, bîneke ecêb bi ser xwe dixist, ji avê bêtir mey dinoşî û digot: bila bîn a meyê bifûre!!henneyê ez kuştim.

Min helbestên xwe jê re dixwendin, serî dihejand û digot: berde.....serhildan û xwîna mêran tiştê qezenc nekirin, wê qerwelkên te çi rêxê bela kin? û qedeha xwe dikire yek qurt.

-Tu dizanî mey çiyê? nalîna rezên tiriye, hêsirên goşiyaye, mey kenê xwedêye.....û digiriya.

-Te dîtiye çawa henne xwe ji guliyên bûkan berdide!!?  
pirtik pirtik tê xwarê, min bi van çavên xêrnêdîtî, sê keçik di çemê Munzur de dîtin, melesên wan bi ser avê ketibûn, bi lekehên sor xemilî bûn ew meles, xwîn bû yan henne?  
Ma ferq heye!!

û straneke ku min jê fêm nedikir digot:

Min şima piya wîrdo kirwanê Xizirî

Pirço ti bê nabêbextiye mekerî

Min o to çiçikê Delalê piya lîto

34

Seyid Riza ocax bû bira, li ber sêdarê berê xwe da ezmanê kerr û got: xwedêyo! tu wî Mustafa Kemalî zû bînî nik



xwe, da ku ez wî mehkeme bikim. Salek neçû Atatürk mir.  
Êvarekê hevalê min yê Dêrsimî venegeriya mal, li  
çayxaneyê jî xuya nekir, kolan kolan ez lê geriyam, min  
dida ser şopa henneyê, ez li keçikin sergirêdayî rast  
dihatim, li tûrên qetiyayî, li bayên Dêrsimê, ez bêhêvî  
mam, rojekê pîreke falnas derbasî çayxaneyê bû, ez li ber  
rûniştim û min jê re got:

Falekê ji min re veke. wê fincana sernexûn rakir û lê nihêrî  
û got:

-çend Filsan bide pîra zal, fala te dibe zelal. Min du Filsên  
iraqî dirêjî wê krin.

Çavên xwe xistin binê fincanê û got:

-Her şarekî tu lê bimînî, gora evîneke teye, ayyyy dilê te  
derizîye, sê ribê mûma jiyana te şewitîye, ezîzê ber dilê te  
reviyaye, mirina te li nava çiyaye, a binêre fala te weke  
sibehekê xuyaye. Ji hîva li çarde bitirse, bawer nakî ji  
falnaseke dî jî bipirse!!

Pîrê fincan nêzîkî rûyê xwe kir û ji nişkêve qîriya:

-Henne di binê fincana te de çi digere!!!

\* \* \*

Sala hezar û nehsed û sî û neh ber bi gorê ve diçû, Polonya  
dihate hêran bi diranên Naziyan, Hitler xwe amade dikir  
Parîsê têxe berîka xwe, xelkên Silêmanî jî digotin: wê  
Alman werin îraqê, bîrên petrolê di xewnên Hitler de  
teqiyqne, dost û nasên min roj bi roj çêdibûn, Amêdyê  
weke pêtekê di xeyalê min de diçirisî, bi demê re dibû arî.  
Êvarekê Sadiqê Behadînê Amêdî hate mala min , min  
gazinê nehatina wî kir, wî jî mamostetiya xwe kire behane

û rojnameyek li ber min raxist:

-Tu helbestan dinivîsî, ev rojnameya Jîn e, jê re binivîs.

Wê şevê ez gelekî şabûm, min bi dilgermî rûpelên wê  
qulibandin, ez gelekî tê nedigihîştim lê min bi eşq

35

xwendin gotar û helbestên wê, min ji Hawarê bêtir hez  
dikir.

\* \* \*

çayxane tijî bû, ji dûyê cigareyan kesî kes nedidît, te digot  
şerê eniya sehra ya Misr e, weke pêtageke hingiv deng li  
nav hev diketin, min li qunceki Sadiq dît:

-Bado Bado.

Min sêniya çayê danî û çûm li nik wî rûniştim, xortekî  
navoser li rex wî rûniştibû, wî em bi hev dane naskirin:

-ev Badînê Amêdî ye –destê xwe di sînga min de lêxist-û  
ev mamoste Nûrî Emîn e berpîrsê Jîn e.

Me dest da hev û ketin axaftineke quto quto, tê bîra min  
Nûrî ji min pîrsî: tu çi karî li vir dikî? min got: çayçî me  
kaka, ma Badîniyek li nav Soranan dikare çi bike.?

Nûrî ez bi Sadiq re dawetî sersalê kirim, lê min got: ez bi  
tenê me hûn werin wê çêtir be, ew şev ji bîra min naçe,  
berfeke fedyok dibariya, şeqamên Silêmanî bêdeng bûn  
wê şevê, di odeya xwe ya biçûk de rûniştibûm, guhê min li  
derî bû, çavên min jî li kolana weke rûpelên nivîskarekî  
tembel bû, saeta Serkîsof ya bavê min ji Qarsê bi xwe re  
anîbû, neh tamam digot, dengê aram ji derî hat, qeflek  
xort û keçek derbasî odeyê bûn, Sadiq danasîneke bi lez li  
dar xist, ez ji hiş çûbûm, lal bûbûm, gelo mumkine kes bi

vê ciwaniyê hebe?! xwedêyo te bi tayên kîjan ronahiyê tevna vê horiya nazik ristiye.?

-Ev Jale ye, Jaleya Caf e, belavkera Jîn e, Nûrî got.

-belavkera Jîn e û mirovan dikuje! Min bi dengekî nîv bihîstî got, lê guhên Nûrî li min bûn, got: tenê yezdan vî karî dike.

Jale di nav kenekî sivik re, dîwarên odeyê bi awirên xwe yên xwedayî şeh dikirin, got: Bîna henneyê ji odeya te tê!

-Ev bîna Dêrsimê ye.

Çawa wê ji bîra min biçe ew şev?! Keçek bi wê ciwaniyê ji bîra keran jî naçe, di wê tîbûnê de, qurtek ava sar, di wî 36

agirî de zozanek ji hênikîyê, di wê windabûnê de stêreke geş! min dev ji karê xwe berda, çend Dînar di berîka min de çêbûbûn, ez bûme belavkerê Jîn!

-Badîn tu helbestan nazik dirêsi, be daxewe xelata Nobel îsal nîne. şerê mezin çalakiyên weke sporê, belavkirina Nobel, û vexwarina meya BORDEUX , ji bala mirovan avêtibûn. lê ez nizanim Jale qerf û tinazî dikirin?! yan rast helbestên min xweş didîtin ?! wê digot ez ji vî cûre helbest hez dikim, serbestin, azadin, çawa bixwazin difirin, mixabin tu bi kurmancî û tîpên Latînî dinivîsi.

-Ezê ji bo te bi Soranî jî binivîsim, bi zimanê ewran û çem û tilûran jî, ez û helbestên xwe di fermana te de ne, ezê bi xwîna xwe jî helbestekê binivîsim!

ez li ber tu mirovî wîqasî sist û bêçare nebûbûm, lê ew ne mirov bû , ew perî bû, horî bû, firişte bû çi bû? nizanim, lêvên wê qerf û tinazî bi qerenfilên sor dikirin, kenê wê

dîlana yasemînan bû, henasên wê gulesêv bûn, û çavên wê  
. .na. . xameya min li ber wan her du şaneyên hingiv  
lalin, memikên wê. . . . .

Hêdî hêdî evîna wê weke geyayekî li dû baraneke biharî di  
beyabanên dilê min de şîn hat, min Amêdyê ji bîr kir, roj  
bi roj keça meta min dadiwerivî binê bîra bîranînan.

Em herdu westiya bûn , me pêncî rojname, belav kiribûn,  
û gavên me yên tirsonek em dihajotin odeya min ya sar,  
bayê ku ji Pîremegrûn diherikî, weke derziyan rûyê me  
ditevizand.

-Îşev li ba min be! min bi bêhêvîbûn got.

-Emê vexun?! pirsî.

-Erê.

-Çi!?

-Wîskî.

Wê şevê ez di ezmanekî sor de firiyam, di hingivê bedena  
wê ya nerm de min avjenî kir, lêvên min, tiliyên min,  
ranên min, dîn bûbûn wê şevê.

37

-Badîn bese te ez kuştim.

-Bes niye.

-Vî qasî tu tî bûyî!?

-Ez ne tî me, ez tîbûn bi xwe me.

Ez dame ber hemêza xwe ya bihiştî û got: tu yê minî.

-Erê... weke dibêjin: heta hebim ez ji te ra me, ku ez  
mirim ji axa sar ra me.

ew weke minalekî, li ber xwendina min ji helbestan re kete  
xew, hilm û henasên wê, te digot kulîlkên kerez û biyokan

e, porê wê gencîneyekî zêr bû li ser palgehê belav bûbû,  
çemekî şîr bû bedena wê di nivîna min de herikî, min  
tehlîya rojên xwe di hemêza wê de bingor kir, dîwarên  
odeya min ji ramûsanên me sincirîn, dojeheke ji bihiştê  
xweştir bû ew şev, lêvên min du kew bûn ew bedena har  
nikil dikirin, tiliyên min gayên dîn bûn ew sînga weke  
berfa Qeredaxê cot dikirin.

Bihar di bin lingên te de diherike

Tu derbasî ferhengekê bibî

Wê peyv weke çivîkên ber rojava

Ref bi ref

Li ser şaxên giyanê min bicivin

Û bibin helbestek.

-Bêje Bado, ev gotinên te ji lorîkên dayikan jî xweştirin.

-na Jale, gotinê min bêkêrin, Pîremêrd jî nikare pesnê  
ciwaniya te bike.

Sibehê dema em ji xew rabûn, ez ji şabûna giriyam, li  
Silêmaniyê, keçek serbest were ba min û bi min re Wîskî  
vexwe?? Û di nivîna min de şoreşekê li dar xe!! tişteki  
bawer nabe, di romanên de jî naqewime! Jale ez dame ber  
hemêza xwe û got: bo çi digirî?

-Ditirsim xewn be.

-Xewn be jî tu ne poşmanî, ez ya te me, kurmancê min. û  
nuqurçek li ranê min da, ez çeng bûm, bû tiqtiqa kenê wê  
û got: te dît? ne xewne.

38

\* \* \*

şev xençereke reşe

bi dilovanî, bi hovîtî  
derbasî vî dilê razayî dibe  
roniyeke birîndar ji stêrkên xilmaş dinqute  
û kadiz. . .

mîna xewneke ji bîr bûyî  
li ezman avêtine  
berbang daleqandî dinale  
ez jî. . .

bi çavin ku rezê xilmaşiyê  
goşî bi goşî ji wan daverivîne  
stêrikan diguvêşim  
da ku xewnên xwe yên şikestî  
ronî bikim.

êdî pênûsa min dikeve xewê di hemêza tiliyên min de.  
Her ku pênûs dibe mêvanê tiliyan, bîranîneke şewitî jê  
diherike, dil mîna berûyan dibiriye, êdî nepirsin çima bîna  
ariyê ji rûpelên te tê.

Erê , di vê şeva sêwî de , bîranînên min rê nadin çavan ku  
bi aramî razin, mirina min nêzîk dibe, falnasên şengalî  
derewan nakin, ew di dûrbîna xwedê re paşerojê dibînin,  
weke ku li neynikeke safî yan li cama Cem binêrin, ez jî  
dixwzim jiyana xwe li ser van rûpelên mest raxînim , mîna  
tiriyê payîzê, ku li miştaxa rezekî tê raxistin.

-Badîn tu hîn ji Jale hez dikî? Mujde bi rûyekî tirş vê sibê  
pirsî.

-Kes ji birînan hez nake.

-Lê xuyaye ev birîn bi te xweşe!!

-Mujde.....jana birînê ji xençerê nepirse, lê tûjiya xençerê

ji birînê bipirse.

ez çîroka Jale qeto qeto ji Mujde re dibêjim, divê ez vî  
kevirê giran ji ser dilê xwe hilînim, heft salin ev dil  
dikizire, heft salin ev birîn vêketiye, heft salin ev evîn  
39

ranazê, ev çîrok dimeye, ezê bi barana nivîsînê vê dojhê  
vemirînim.

rojekê ez li ber derê medreseya seretayî rawestiya bûm, Jîn  
a pêçayî di destê min de bû, xortek pêrgî min bû, keniya û  
got: merheba Badîn!

-Be xêr hatî, ji ku min nas dikî?

-Ez şewketê Caf im, hevalê te Hisên behsa te ji min re kir.

-Hisên ji Dêrsimê!!?

-Erê, min berî du rojan li Mûsilê ew dît, tûrekî henneyê li  
milê wî bû, karê xwe û çûna Dêrsimê dikir, wî digot:  
henne li Dêrsimê nemaye.

Rojekê şewket ez dawetî civîna Hîwa kirim.

Hisênê Dêrsimî digot: siyaset weke jinê ye, tu wê tazî  
nekî, jê fêm nakî! wê şevê min xwe tazî dît, çawa tu bê  
rêxistin dijî? yên li civînê ji min dipirsîn! ez bûme endamê  
partiyê, bûme beşdarê nakokiyên di navbera Hîwa û  
Komeley birayetî de, me qerfên xwe bi zikê şêx Letîfê  
Berzencî dikir, endamên komelê jî tinaziyên xwe bi me  
hemûyan dikirin û ji me re digotin partiya Efendiyan,  
gelek qiriktehlî di nav me û komonîstan de jî hebû, yekî  
komonîst hebû tim ji min re digot: te fikrên Stalîn  
nexwendine, hezar sal bo te divên ku mejiyê te bişuxule.  
wan ji me re digotin: hûn şovenîstin!! hinekan ev navê

ecêb nebihîstibûn, hêrs dibûn û digotin: kafirên qûn bi gû, ji me re dibêjin şorbenîsk, ka hela ew çi rêxin? di Hîwa bi xwe de du baskên ji hev dûr hebûn, ez bi çepgiran re bûm. lê Hîwa ya min ya rast û durust Jale bû, ez endamê evîneke gawir bûm li Silêmanî.

Bi rojan min ew nedidît, dilê min weke masiyekî ji avê derketibe diêşiya, ez li her deverê lê digeriyam, min pirsar wê ji kolanan, ji hîvê, ji stêrikên berxew, ji refên qulingên di tariyê de difiryan, ji awirên xelkê, fikir, xwezî min zanîbûya ev xezal li kîjan beriyê diçêre?! tiştêkî nedikete 40

seriyan ew evîna weke birûskekê bi lez xwe li dilê min girt.

Ji nişkê ve xuya fikir, weke tavek e biharê bi ser min de dibariya. min bi melûlî dipirsî: Jale tu li ku bûyî?

-Ez di dilê te de bûm.

-Qenefila min, tu her di dilê min deyî, lê ez dixwzim te bi çavan bibînim, çav ji te têr nabin.

-tê her bimînî çavbirçî.

-Jale tu ji min hez dikî?

-çon debînî?

Wê hîç nedigot ez ji te hez dikim, her ku min bipirsiya, digot: çon debînî? ku ez didîtîm jî, ji ramûsanên hov her dever di bedena min de şîn fikir, ez bi gezan dîn dikirim, dihat ku min bi xavî bixwe, min digot: eger ev ne hezkirin be, çiyê.?

\*\*\*\*

Meha Hezîranê ..... Silêmanî



Dojeh dibawêşkiya wê mehê, ji germa re tilûr ji ezmanan diweşiyayn. ne tenê hejîr û tû, dil jî stewiya bûn, Ewropa jî weke hirmiyekê di lepên Hitler de perçiqî bû, nakokiyên di navbera herdu baskên Hîwa de kûrtir bûbûn.

-di vê rewşa han de, em nikarin dijîtiya îngilîz bikin.

-ji vê rewşê çêtir nabe, îngilîz bi Hitler biliyane, fersenda me ye îro.

Roja ku Nazî derbasî Parîs bûn, xelkê bi kêfeke diyar, pîrozbahiya hev dikirin, ez pêrgî Jale bûm, min ew bêkêf dît;

-çi bûye Jale ya min?

-Ma te nebihîst Parîs çû!?

-Inşallah London jî bi dû de here, evîna me paytexta me ye.

-Tu dînî Badîn!wê Alman mala me li mîrata reş bigerînin, eger werin vî welatî, kevir li ser kevir nahêlin.

-ji dest îngilîzan çend kevir li ser hev mane!?

41

-Îngilîz Iraqê diparêzin!

Min dît em dikin ji bo xatirê îngilîz û Almanan bi hev kevin, min got: ka em herin DERBENDÎ BAZIYAN!!

-çi bikin?

-Ez dixwim cihê ku bavê min lê hatiye kuştin bibînim!dibe ku ezrastî giyanê wî bêm!

Piştî meşa seetekê em gihane wir, Qewan û beybûn û endekoyan di wê germê de govend gerandibûn, gelek kulîlk ji qelşên zinaran derketibûn û li hawîrdor dinihêrîn, hîn bîna barûdê ji zinaran dihat, bîna tûtina ku di wê cengê

de hatibû sotin ji axê difûriya, ez û Jale di siya latekî de rûniştin û min qewanek çinî, wê tiliya xwe dirêjî zinarekî kir û pirsî: Badîn tu navê vî hîmê han zanî?ev“Berdî Qareman e“li ber wî şêx Mehmûd birîndar bû, dibêjin sê cixare ji tûtina koysenceqê li dû hev kişandin ji ber jana birînê, lê cengawerekî jî axîna wî nebihîst.

-îcar te nas kir çima ez ji ingilîz nefret dikim?

-Serokê te Refîq Hilmî ji wan hez dike.

-û tu!?

-Ez ji wan nefret nakim.

Û ji pişt de destê xwe li min pêça û bi nazikî got: tu partiya minî!

Ez li pişt xwe zîvirîm.

Herdu kepûyên me li hev ketin, lêvên min tûşî lêvên wê yên şekirbar bûn, henasên wê yên sêvîn xeyalê min birin bihişteke efsaneyî, çavên wê ez xewixandim, bi hev re em li binê zinarê lal gindirîn, bahoza şehwetê li me rabû, bahozeke lal, û em dane ber xwe, kulîlkên xwedê di bin gevizandina me de dinaliyan, qewana di destê min de pekiya dûr, tazî bûn em li wî geliyê tazî, li bin ezmanekî tazî.

Sura bayê rojava hat, Jale li ber kete xew, min cilên xwe li xwe kirin û rahişte wê qewana pekiyayî: ji min hez dike...nake...dike...nake..erê..na..erê..na...pela dawî ji

42

qewanê, bi gotina Na re weriya, Jale di nav çîçekan de mabû, ez hinekî li ser lingê xwe geriyam, ji nişkê ve tişteke li ber çavê min biriqî.

Qutiyeye zîvîn!!ez li ber xwar bûm, cigareyeke nîvco li ber bû, nêvî arî, nêvî pela pêçayî, min qutî hilda destê xwe, nivîseke bi tîpin nêzîkî tîpên Siryanî li ser bû, qutî tijî tûtîn bû, cigareyeke pêçayî weke termekî ziravik li ser ramedandiyê, min qutî berda berîka xwe û ew cigare pêxist.

)di civatên zilamên Amêdyê de, qala tûtina Etrûşê dikirin, lê hin mêr hêrs dibûn û digotin: tûtîn ya Koysenceqê, ji bilî wê rîx e!di nav re dengê kalekî simêlzer dihat: tûtina dinyayê li Xursê ye, li wir tûtîn di kefa destên mirovan de şîn tê, li ber nalînan şîn tê, bi keserên evîndaran re û li ber tava hîvê hişk dibin pelên tûtînê, cigareyek ji wê tûtînê agir e bi pûşê xeman dikeve, ma tûtîn çiyê? nefesa xwedê ye bêguman.(

Dema min nêzîkî li Jale kir, çi binêrim, hezaran pepûle û perwaneyên rengîn ew nuxumandine, porê wê yê zêrîn bi toqên ji perperîkan xemilandî bu, pêjna min kirin firiyên û li ser kulîlkên hawîrdorê veniştin, Jaleya bejna wê weke nalînekê, keniya û got: Bado min xewnek dît, min dît ku ez bûme Nêrgîzek û heng şîle ya min dimijin.

Min got: ji bilî min tu heng nînin û nahêlim hebin jî.

çavên wê li qewana peritî ketin, keniya: qewana te çi got?

-Na got.

-te jî bawer kir!?

-qewanê weha got , kulîlkên xwedê derewan nakin.

-û ev çi bû berî kêlîkekê me kir, tu çi navî lê dikî kurê

Hîwa!?

\* \* \*

Min nedixwest kes ji hevalan bi evîna min bihese, min  
xwe ji çavan vediçinî, lê veşartina evînê weke ku dizek  
dest bihavêje mirîşkê, ji pînê derxe bê ku qîqîniyê bike,

43

xwîniyek ji ber çavê dewletekê tê veşartin, lê evîn na, ew  
di dilan de tê çandin û di çavan de şîn tê, di çavên min de  
jî ne bes evîn şîn hatibû, lê daristanekê dîlan gerandibû.

Carekê min ev kurte helbesta xwe da Nûrî Emîn da ku di  
Jîn de biweşîne:

Sînga sipî rengê reza

Ez ketme nav de wek diza

Min jê çinîn goşyên tirî

Lib lib min ew dan ber geza

Nûrî keniya û du sê caran li ser hev got: wek diza!! ji

xwe evîndar dizin, aşiqo.

-çi!!?

-Badîn mukur were, ez hay ji her tiştî heme.

-çi!?

-Jale.

\* \* \*

Ezman zelal bûye, komek çivîk li ser kevîkên rût yên  
dîwarê hewşê bi awazin nizim distirên, bayê kurr yê ku bi  
şev pêde dizûriya, ewrek li ezman nehişt, tenê rûpelên  
berfê li ser dîwaran xilmaş bûne, termên deh cigareyan di  
xwelîdankê de rêz bûne, min çîroka Jale neqedand, ma  
diqede hilatina rojê?

roj hilat.

\* \* \*

.1Adar. 1946

fotografçiyê ku îro hate medresê, kalekî Ermenî bû, Nûbar Nalbendiyan, nizanim çima ew qasî li min dinihêrî, di kolan û caddeyên rûyê min de li xizmekî xwe yê winda digeriya, çavên xwe qet ji min qut nedikirin, ji nav hemî mamosteyan navê min pirsî, ez lê ketim gumanan, gelo ne casûsek e? ziq li min dinêrî, ji nişkê ve got: eger tu vala bî, sibehê were studyo ya min.

navnîşana xwe da min û kameraya xwe ya KODAK hilgirt û bi rûyekî mest ji odeya mamosteyan derket.

44

\* \* \*

Studyo ya Nûbar, di Qeyserîyê de, li pişt Meydanî Asingeran e, qarmeyeke reş, zingarî li ser e, bi tîpin Farisî û Ermenî ( Ekkasî WAN) kolaye. di camekê de fotografekî Pêşewa, bi riya xwe ya sivik xuya dikir, ez gelek caran di ber re derbas bûbûm, lê min bala xwe nedabûyê, tu carî nehatibû bîra min jî ez fotoyê xwe bikişînim, li tenişt studyo, dikaneke weke gorekê hebû, kalekî kinik, ser bi kum, rû girover, çav kujûlî, li ber çend kokelên werîsan rûniştî bû, werîsên naylon, kêndir, pembo, zirav, qalin, navîn, kin dirêj, yekrengî, durengî..., îro di çûna xwe ya studyo de ez hinekî li ber rawestiyam, barana werîsan hate bîra min, min ji kalo pirsî: ev çi werîsin heccî?

-dibin ligam û hefsar, ji bo piştîyên êzingan bi kar tîn , ji bo girêdana kerên gundiyan bi stûnên caddeyan ve, ji bo landik û hêlanên minalan, bendkirina dînan, derxistina ava

binê bîran, ji bo. . . .

-ji bo bidarvekirina tawanbaran!

-cane kem tu hîn xamî, tu nizanî ku yek caran welatek jî bi sê gaz werîs têk diçe?

Nûbar li pişt maseyê nizmîk rûniştibû, di bin cama li ser wê, fotoyên gelek kesên ku ez wan li zikak û kolanan dibînim, hebûn, çav li min ket rabû ser xwe û ez li rex xwe dame rûnişkandin, kenekî pîr wek girî di rûyê wî yê sor û bê mû de çirisî û got:

-tu ne ji Mehabadî.. ne?

-tu çawa zanî?

-ev bîst û pênc salin ez li vî bajarî me, min rûyên

Mehabadiyan yek bi yek jiber kirine, ez yekî ji wan roja qiyametê jî bibînim ezê wî nas bikim, rojê çend tîn xwe li ber vê kamerayê diedilînin, û destê xwe dirêjî kamerayekê li ser sêpiyekê li derve kir, gundî, axa, qutabî, mele, feqî, jin tenê na, kamera jinan dixun ! û hinekî kenîya... pişt re  
45

berdewam kir : lê rûyê te tîr ava Mehabad nebûye, dema min tu dîtî , xwîna min keliya, nizanim çî bi min hat mamoste can!?

Min qutiya tûtina xwe derxist, û jê pirsî: tu qelûnkêşî? ji te re cixareyekê bipêçim?

dema çavên wî li qutiya zîvîn ketin devê wî ji hev bû, ji hindav destê xwe avête qutiye , tûtin li ser maseya wî rijiya, foto di bin tûtînê de man, bi hêrs pirsî:

-Te ev qutî ji ku aniye?

-min ji silêmaniyê kiriye!

-Ev qutiya min e, û bi lez berçavka xwe ji berîka sixmeyê xwe derxist û li nivîsê nihêrî: weke xewnaye!!ev qutiya min bû, berî sî û du salan min diyarî hevalekî xwe kir, em bi hev re li Sari Qamişê bûn, min bi singuyê navê wî bi Ermenî li ser kolaye binêre!!dawî ez reviyam, tev li Rûsan bûm û ew jî hate kuştin rebeno, çiqasî qelûnkêş bû rehmetyê Ênisê Amêdî.

Ez ji darekê ketim! gelo mumkine ev qutiya bavê min be? mumkine Nûbar û bavê min heval bûn?! min jê re got: navê bavê min jî Ênis e, ew jî ji Amêdyê ye, û li Sari Qamiş bû, lê li wir nehate kuştin.

-çi pê hat!?

-ji şer reviya.

Nûbar tûtina ku li ser maseyê rijîya bû bi destin lerizî berhev kir, cigareyek pêça, zimanê xwe li kenarokê pela spî û tenik xist û bi gezin biçûk cihê şilbûyî qut kir, piştî nefeseke dirêj û bê yî ku dû ji singa xwe berde got: pel jî ew pelin, tûtin jî ew tûtin e, ya Xursê ye, ez nas dikim.

Min ji wî re ta bi derziyê ve kir, wî ku bihîst navê diya min Hamêst e, giriyeke nizamî çawa kir, ne girî bû, orîna gayekî ku serjêdibe bû, li ser wî dengî, dikançiyên nêzîk li me kom bûn, berî hemiyan, werîsfiroş derbas bû, Agop ê 46

meyfiroş jî bi lez hat û pirsî: çi qewimîye dîsa? min bê perwa bersiv da: Neviyekî bapîrê xwe dît!!

Agop ji min fêm nekir, berê xwe da Nûbar -ez bibêjim bapîrê min- û bi Ermenî axivîn, her carê serê min digirt û

radimûsa, di nav giriyê xwe re digot: Badîn neviyê min e  
Agop, !kurê Hamêst e!!

Kalê werîsfiroş ji ber deriyê studyo meşiya, destên xwe  
dane pişt xwe û di ber xwe de got: Nûbarê Ermenî dîn  
bûye. Eger hûn bixwazin wî girê bidin werîsekî jê re  
bibin!!

\* \* \*

dema Enwer Paşa di Sari Qamiş de şikest, leşkerên wî  
bûne weke stêrkên ku roj li wan hilê, her yek bi deverekê  
de çû, berî wê jî serbazên Ermenî hemû reviya bûn û xwe  
teslîmî artêşa Rûsya kiribûn, Osmaniyan bi xwe di dawiya  
şer de ew dihavêtin derên asê û zor, ew weke pezên gurrî  
ji nava leşkerên xwe derdixistin, Entranîk yek ji wan  
serbazên ku xwe teslîmî artêşa Rûsî kiribûn, û bi Rûsan re  
êrîş dibirin ser bajarokên Kurdan, bi kîneke kor Kurdên  
sivîl dikuştin.

-Me li Rewandizê pênc hezar kuştin, me dil nedihîşt em bi  
gulleyên xwe Kurdan bikujin, bi saxî me ew dihavêtin  
çemê Rewandizê, bi singuyan me xelk dikuşt, kalkê min  
Entranîk -yê ku navê xwe kiribû Nûbar- weha digot çîroka  
xwe:

Artêşên Rusya weke gêrikên ji mûristaneke baran bi ser de  
hatibe, ji bakur dikişyan, berê wan li Erzerûmê bû,  
leşkerên Osmanî jî li nêzîk Sari Qamiş, bendewariya  
qedera xwe ya reş dikirin, ji serma diranên wan nedihatîn  
ser hev, berfê girr ji erdê girtibû, bela xwe di xwezayê  
dida, du serbazan pişt xwe dabûne hev, yekî cigareyek  
dipêça, yê dî straneke Ermenî digot:



Maratûk partsîr sarîn

Tsûn gîdvêlê imyarîn

47

Sîrdis likkûgê arîn

Tirrnîm hasnîm imyarîm

Xorodîk morodîk imyarnê

Mêk hadîgê xumarê

Xêçon încû likkûgê?

Veryêresi pikkûgê

Versir dîgê likkûgê

Verbêxêrê dingûgê

)çiyayê Mereto bilind e

li serê wî bûye berf

dilê min tijî xwîn e

bifirim bihêm yara xwe

yara min yara min

yek tenê ye xumara min

Xêço çima erinîye?

Rûyê wî nepixîye

Dilê wî tijî bûye

Simbêlê wî bel bûye?

Ûnis li rex Entranîk rûniştibû û kufkufa wî û cigareyan bû:

Ûnis: “cigareyekê dirêjî Entranîk dike“kirîvo kerem

ke , ev tûtina Etrûşê ye, hestiyê xwe pê germ bike.

Entranîk: “strana xwe dibirre“birazê dev ji min

berde, ma tu nabînî em bi xwe bûne tûtin di Qelûna Enwer

Paşa de!?

Ûnis: “dûyekî dirêj ji cigareyê berdide“ ya Enwer

Paşa çi ye.!

Entranîk: “tivinga xwe zeyt dike“ez dixwazim bibêjim em bûne êzingên vî şerî, em disojin , xeyrî me xwe germ dikin.

Ûnis: “bi devekî ji hev“çawa?

48

Entranîk: ezê ji te bipirsim, çima tu hatî vî şerî?

Ûnis: ez ji xweber hatim, ez feqe bûm, dewlet jî feqeyan naşîne cengê, lê cihada gêwir ferze.

Entranîk: tu musulmanî ne wisa? mesele ne cihad e birazê, vaye ez Xiristiyanim û li rex te me, çima? em Ermenî her sal bac û qaçora xwe didin dewletê, ne divê me neynin vî şerî? ma tu bala xwe nadî Osmaniyan? Alman piştgiriya wan dikin, binêre hekîmê Almanan çendin di vê alaya me de? Brozart Von Schelendrof li kêra zikê xwe digere li nav Osmaniyan? ma ûris û Alman ne weke hev gawirin birazê?! “kesereke dirêj dikişîne“ ka tûtina xwe bide min, te kulên min tev rakirin.

Ûnis: bi Mihemedê me û îsa yê we ezê ji tere yekê bipêçim. . . . . cigarê dipêçe û distirê:“

Ev tûtina misk û ela jê vedixun mîr û mela

Yê ku dibê tûtin bela ew qet nizane lezzetê.

Entranîk: “berê xwe dide alî Wan ê“ aaax birazê, van Tirkan çi bi serê me kirin û çi nekirin, dibêjin gola Wanê ji hêsirên evîndaran çêbûye, ez dibêjim ji xwîna xelkên bêguneh e, min serên firiyayî bi çavên xwe dîtin, gelo Islam ewqasî oleke tîxûn e!?

Ûnis: kê got? min bi xwe ji devê şêx Behadîn li Bamernî

bihîst ku qetla mirovekî bêguneh, weke qetla xelkê hemiyaye. Wî digot xwedê weha di Quranê de dibêje. Entranîk: de bi vê terazûyê, Islama Contirkan û apê xwe Enwer Paşa bipîve!!

Xeyalê Ênis weke hespekî ew ajote pehnavên salên berê, ew yek ji siwarên mîr Reşîdê Berwarî bû, ketibû sêzde şerên sext bi Tiyariyan re, kîna “Mexînan” di nava wî de hêlîn çêkiribû, lê bi naskirina Entranîk re çavên wî li gelek tiştan vebûn, Entranîk jê re digot: kirîvo, Osmanî dixwazin bi derziyeke ji hestiyên we, û tayin ji rehên me, kirasê Imperatoriya xwe yê riziyayî pîne bikin, lê heyhat, ev 49

Imperatorî bûye gayekî pîr, çavên Ewropiyan jî li çermê wî ye!!

Kêfa wî gelekî ji Entranîk re hat, roj bi roj kîna di dilê wî de, weke şapên berfa ku tavika Nîsanê lêxe, bi suhbeta Entranîk re diheliya, Entranîk jî herweha jê hez kir, qutiya Almanî ya tûtina xwe, diyarî wî kir û bi singuyê navê wî bi Ermenî li ser kola: Ênisê Amêdî.

ew ne berf bû wê rojê dihate xwarê, xweza dîn bûbû, har bûbû, te digot qey ezman li wî şerî hatiye xezebê û dixwaze agirê topan, bi kuliyan berfê vemirîne, serbazên berî destpêka şer serê xwe weke leglegan xistibûn nav milên xwe, êdî li pişt top û metralyozan, di wan kozikên sar û çeperên qûmê de, nedikarîn xwîdana xwe bimalin, ne berf bû bariya bû, kevalê wênekêşekî dîn bû , ku bi destin lerizî, firçeya xwe ya ji rengê xwînê têt, di wî cawê spî dabû, na ne berf bû dibariya.

Mîna pelên perîşan, bi hezaran serbaz ji darên artêşan  
diweşyan, ling û destên qutbûyî, serên firiyayî, mîna  
qurmên daristaneke şewitî di nav berfa bêdeng de  
dixewinîn, bi hezaran jî di cihê xwe de ji sermayê hişk  
bûbûn! Osmanî tar û mar bûn, yên ku çengela mirinê bi  
ber devê wan neket, yan firar bûn, yan jî tebayî Rûsan bûn.

\* \* \*

Me kevir li ser kevir nehêla li wî bajarî.

Weha riwayet dike kalkê min Entranîkê Wanlî (Nûbar  
Nalbendiyan), sî sal jiyana xwe weke Vodkayê rû dike:  
Li pey ku tev li Rûsan bûm, min bawer nedikir em derbasî  
Wanê bibin, qirçe qirça parsûyên bajar û gundan bû di bin  
cizmeyên Rûsan de, (eger Osmaniyan parsû ji wan re  
hêlabin), Qars, Trabzun, Erzincan, Mûş, Bedlîs, û  
gundikên wan , weke meyweyên helisî diketin, kî nê em  
kor kiribûn, her ku kî n di dilê me de dihate çandin û  
avdan, gorî û qurban şî n dihatin, xwîn bi rûbaran re  
50

diherikî, hestiyên mirovan li kenarê her rêyekê rêz bûn  
weke êzingan, ez di hevalê xwe yê Badînî Ûnis de  
difikirîm; gelo di kîjan kuştargehê de emê lihev rast  
werin? ne mumkine ez bêhemdî xwe wî bikujim? yan ew?  
Bi hêrs em nêzîkî Wanê dibûn, bîna berateyan difûriya,  
refên qertelan li ser me hêlan dikirin, çi ezmanekî kirêt bû,  
gola Wanê ji laşên mirî genî bûbû, her darek mirovek pê  
ve daliqiyabû, em çi bikin, bawer bike hinek serbaz  
dibeziyane wan û gore ji lingên wan dikirin! min nezir  
kiribû ku ez keça xwe Hamêst bibînim ez heft salan ji

Dêra Axtemara dernakevim.

General Nikolayev destûra serbazên Ermenî yên Wanlî da ku li malên xwe bigerin, destê min li ser dilê min bû, min di dilê xwe de got: bila ez Hamêsta xwe bibînim, kuştî be jî ez li ser nezra xwe me.

Mala me li taxa sûrkirî, nêzîk baxçeyê Qunsulgeha Ingilîzî bû (ax Badîn çiqas pişta me bi wê Qunsulgeha bi gû xurt bû, me nizanî bû ew ala bi xaç ji vala li badibe), ez weke bêganeyekî li mala xwe digeriyam, te digot qey kolan û zikakên wî bajarî çermê solê min nekurusandine, wan bêbavan çi kiribûn ji serê wê Wan a çeleng, ew serobinî hev kiribûn, dîwar ketî bûn, ji tenî û tirafê tarî bûbûn, xwîn û mejîyê pijiqî li ber her dîwarekî çîrok bi temamî got, lê Hamêst ne xuyabû, ne term, nejî hestî, kuro min mala xwe nas nekir!!

Min giliyê xwe, derdê xwe ji Aram Manokyan re got, tu wî nas nakî, ew mêrxasekî me bû, wî bi çavekî tijî gazin û lome li min nihêrî û got: Entranîk, bi deh hezaran keçikên me çûne, xwedê jî nizane li ku ne, tu li Hamêst digerî!! ez li ber xwe ketim, çi bikim Badîn ?! ez bav bûm, te derdê kezebê nediye, her kes birîna wî bi wî xuyaye, ez bi xwe ji bo Hamêst tev li Rûsan bûm, lê ezê wê guloka berfê di nav kîjan agirî de bibînim.!?

51

Berî sê salî temam bû, min bi Rusan re berê xwe da vî bajarî -Sawcbulaq- êdî ez li mirinê digeriyam û wê ji ber min baz dida, cengê li ku tenûra xwe dadida, min xwe dihavête navê lê ez nedihatim sotin, gelek caran mirin xwe

bi qedir dike, bi dest mirov nakeve mamoste.  
 Wê salê Kurdên Şikakî, Herkî, Mukrî., têr talan kirin,  
 Xelîfe bi xwe destûr dabû wan , malê Filleyan li wan helal  
 kiribû, Simiko yê we bi xwe, li dertenga Qutur, pêxwas û  
 birçiyên me kuştin, binaniya dawên kirasên jinan vedikirin  
 -qaşo li zêran digeriyan- jin li nîva rêyan tazî berdidan  
 kurê min!!dawî me ew Simiko yê bi nav û deng weke  
 mişkekî xiste xefkê , û ew hinartin Teblisî, kes di wê  
 cengê de li ser heqiyê nebû, heqiya tu cengê nîne kurê  
 min, her kesî kêr bo yê ji xwe qels tir tûj dikir, Kêrin  
 Almanî bûn, Rûsî bûn, jehr û quzelqurt bûn.  
 Partiyên me Ermeniyen, agir gurr dikirin, Taşnak, Hinçak,  
 û hêzên dî, wan nizanîbûn çawa me ji wê gêjen û gerînekê  
 derxin, dilê me ji kîneke tîr tijî bû, min digot ez bigihim  
 Kabeya li Mekkê, ezê bi ser serê misilmanan de, di heccê  
 de, biherifînim, Hamêsta min çû êdî ne xema min tiştêk  
 bû, min ji Rusya derewîn jî nefret kir, çawa nikaribû keça  
 min li min vegeranda?!Lenîn rabû, hukmê Qeyser ruxand,  
 artêşa Rûsî bû weke noka li kevir bikeve, her libek  
 pengizî deverekê, serbazan tivingên xwe bi Vodka didan,  
 bi kêlîkekê li gel jinekê didan, ciwan, kirêt ferq nedikir,  
 hemî ji eniyên şer reviyen, ez yek ji wan bûm, min tivinga  
 xwe da qaçaxçiyekî Şikakî bi deh Qiranî, û berê xwe da  
 Kirmanşah, wê çaxê me digot: ji Kirmanşah dûrtir nîne,  
 wan salan, Ermen li her deverê belav bûbûn, te kevirek ji  
 ku rakiribuya Ermeniyekî çavtirsîyayî di bin de melisî bû,  
 min li Kirmanşah ekkasekî Ermenî ji Xarpûtê nas kir,  
 navê wî Nûbar Nalbendiyan bû. ewî dinya dîtibû, û ez

fêrî her tiştî kirim, ne tenê ez bi xêra wî bûme Ekkas, belê ez fêr kirim çawa bijîm, wî digot: Ermenistan ev studyo

52

ye, Xarput jî, ev Vodkaya ku her şev dinoşim, binêre evîna Xarputê çi anî serê min?! û digiriya.

binêre, ev Kamera demê êsîr dike, vodka jî me ji demê rizgar dike.

Nûbarê Xarputî ji min re digot û wêneyê xwe yê li ber derê dêrekê diçirrand, wî bawerîya xwe bi xwedê avêtibû pişt xwe: eger xwedê hebe jî, wê xwedayekî newêrek be. Kalkê min yê nû, dawî ez birim mala xwe, ya rast odeya xwe, li herekey Hermenyan , dîwarên odeya wî bi wêneyêkî mezin yê Nûbarê Xarputî xemilandî bû: wî navê xwe jî da min.

\* \* \*

Bihar diherike vî şarê li hevketî, weke çawa evîna Mujde diherike dilê min, êdî germ dibe tavik, berf dihele, û rûbar mîna evîndaran har dibin, aware dibin, û min bêriya wê kiriye, bêriya porê wê yê kin weke şevên havînê kiriye, min bêriya lêvên wê yên weke du qeyikên ji qendê, ev bûne du roj ez wê nabînim, ez bi çûna mala kalkê xwe mijûlim, dixwaze ez li ba wî bim.

-kurê min, guhê gorê ji min ve xuyaye, mîrata mirinê jî berê tehle, îcar bi tenê yek bimire!!

-ma mirina şêrîn heye kalo?

-erê kurê min, mirina di meyxaneyê de, yan di hemêzeke germ û nerm de.

8-3-1946Mehabad

Li gor peymanana Rûs û îngilîzan, divê serbazên Rûs ji erdê Iran vekîşin, îro heştê Adarê ye, Rûsan xwe bêtir bi cih kirin e, berî du rojan bi sedan tankên(T34)li ser sînorên Iraq-îran, Tirkî-îran rêz bûn, Ingiltere û Emerîka protesto dikin vê tevgerê, Emîral axa yê Mehabadî jî , îro êvarkî hate ber deriyê min, satila wî berxweş bûbû, du sê heval jî pê re bûn, bêyî ku silavê bide got: mamoste tasek av.

53

-Derya çawaye?

-hindik maye tu xumxuma pêlan bibihîzî.

-vaye Rûs me bi deryayekî ji hesin dorpêç dikin.

-Ne ji bo Mehabadiyane, Stalîn ji bo tûtina Qelûna xwe weha dike.

Dêlîya tirî hîn rût e, tu dibêjî bihar jê xeyidiye, yan ew ji biharê, di xeweke zivistanî de ye dara min.

Kalkê min fotoyê diya min xiste çarçoveke zîvîn û got: binêre, çendî cwan bû diya te!çena te, çena diya te bi xwe ye, wekî dî tu kopiyek ji bavê xwe yî.

Dibêjin wê Barzanî û malbatên ku niha li Qumqule ne, van rojan li Mehabad bi cih bibin . Karwanseray Seyid Elî li himber dibistana Seadet bo wan amade dikin.

Pêşewa ne raziye, Kerîm ê Şikakî dibêje.

\*\*\*

Hitler xwe kuşt.

rastiyek bû , lê xelkê bawer ne dikir. ,

-ev yek ji derewên Ingilîzane.

Lê kesî nedikarî dagîrkirina Berlînê bawer nekira, artêşa



sor weke hirçên Sîbîrya yê êrîşî şêrnuşîna Naziyan kirin,  
das û çakûç kete dewsa xaça çiviyayî û sîmurxê bask  
vegirtî û penctûj, Stalîn dû ji qelûna xwe berdida, destê  
xwe di nava du bişkoka re li ser dilê xwe yê hesinî datanî  
û li rojava dinihêrî:

-Oooooof, çi xewneke tehl bû.

Ingilîzên ku ji serketina xwe ya di şer de serxweş bûbûn,  
û du salan bîna xwe li Mele Mistefa fereh kiribûn , êdî  
neditebitîn:

-ev kansera bakur divê were hilkirin.

Tebaxeke germ bû, bi sedan xort ji partiya Hîwa û partiya  
Rizgarî Kurd tev li refên cengawerên Barzanî dibûn. ,

-emê şîva xwe li Hewlêr bixun.

54

Barzanî ji yên li dora xwe re digot.

Lê tu kesî ji cengawerên wî, sêniyên xwarinê nedîtin,  
derengî şevê ew bi zikên birçî, cilên qetiyayî, bi solên  
peritî ku zinarên wan çiyên û striyên wan geliyan roj bi  
roj ew dirizandin, bi tilî û pêçiyên ku ji ser tetikên  
tivingan ranedibûn, di gel Barzaniyê ku ji kerban re,  
herdu birûyên wî yê efsaneyî gihabûn hev, li kelekan  
siwar bûn û çemê Zab qut kirin.

-kelekan bişewitînin.

Barzanî ferman da û bû qirçe qirça textikên şewitî, ku di  
ava çem de vedimirîn wek hesinê ji êtûnê derketî kufînî ji  
wan dihat.

Barzanî şîva dirêj û zirav û weke xetîreyekê vêketî dirêjî  
rojhilat kir û got: ha li wir.

Û bêdeng meşiya.

Bi hezaran zar û zêç, pîr û kal, Cengawerên westiyayî,  
çêlek û pez û segên şivanan, tajîtolên nêçîrê, keleşêrên li  
pey mirîşkan, mirîdên şêx Ehmed bi sicadeyên xwe yên li  
ser mil û û sîwakên di berîkan de û çavên nîvgirtî, tev li  
koça ku ber bi rojhilat ve diçû bûn, te digot qey diçin  
nêçîra rojê, roja ku êdî giran û weke bûkekê ji pişt çiyayê  
Delanper ewr ji ber xwe didane alî. Rêzeke weke nalînan  
dirêj, rêzeke ji deh hezar dilên ku li pey Barzanî dikirin  
gupgup ber bi rojhilat ve diçû.

\* \* \*

Jiyana min li Mehabad xewneke dirêj e, ez dibêm belkî di  
romaneke Rûsî de dijîm, yan di filmekî Emerîkî de!!  
Her rojeke min di vî bajarê bi çiyên û bi xapên dîrokê  
dorpêçkirî de çîrokeke, ez jî her van çîrokan dihavêjim  
van zindanan spî, êdî nema di ber kirîna pelan re digihim,  
pêr xwediyê qirtasiyê ji min pirsî:  
mamoste can...beşqî xuda blê...tu van kaxezan dixwî,  
disotînî? Tu çi ji wan dikî!!?

55

Min tertê pelên spî ku di terazûyê de bêdeng niviyabûn  
rakirin û got:

ev pel beriyêke ji berfê ne, agirê bîranînên xwe di wan de  
vedimirînim! Û min çend Şahî di kefa terazûyê de hêlan.  
Weke her carê çayxane mişt bû, rojê ne kêmkê çewalek  
tûtina gundê Şawer dihate sotin, pêre gelek keser jî ji  
devên bêdeng weke refên qulingan difiriyan, dûyê xekek  
xelekî ber bi banê tenîgirtî ve bilind dibû, her

xwelîdankek termê deh cixareyan tê de ramedandî bû.  
Min berê xwe da maseyeke vala li qunceki tarî û giraniya  
xwe tev de avête ser kursiyeke leq, dengê naskirî  
nizanim ji ku hate min:

-Badîn!

Dema li jêdera deng zivirîm, çavên min li hevalê xebatê  
Nûrî ketin, bê hemdî xwe ez qîriyam:

-Nûrî!!!

Me hevdu hemêz kir, çavên rûniştîyan em dorpêç kirin,  
bi dehan piyalên avê û fincanên qehwe û çayê li ber lêvên  
terikî rawestiyan.

Berî sê salan, dema min berê xwe ji Silêmanî da navçeya  
Barzan, Nûrî Emîn bûbû yek ji heyeta serokatiya partiya  
şoreş ya komonîst ya ku gelek ji endamên wê tev li hêzên  
Barzanî bûbûn, hîn em li Silêmanî bûn, Nûrî ji min re  
got:

agir li ku vêkeve, ez êzingekim.

Vaye îro bûye êzingê komareke gurr, bûye efserek, dema  
min ew dawetî mala xwe kir, lêborîn xwest û got:

Barzanî ferman kiriye ku em ji paygeha xwe dûr nekevin.

-Sayibê Hewlêrî li ku ma?

-Ingilîzan, piştî azirandin û îşkenceyeke pirr ew sirgûnî  
Misrê kirin.

-û Hisênê Dêrsimî?

-Heme Reşîd!!!?

-erê.

56

-li Dêrsimê , termê wî di nava tûrekî hennê de dîtin.

Min yek bi yek pirsâ dost û hevalên wan salên navegerin  
dikir, Nûrî bi dengê ku min tenê bihîst, pirsî:

-Badîn te Jale ji bîr kiriye!!?

-na...ma birîn xençerê ji bîr dike!!!

-ew çû London, bi şofêrê kapitan Mc Kay re reviya.

min bi axîneke dirêj jê re got:

-ez bawerim niha ew li ser çemê (Thames) e, weke  
mûmekê di nava mijê de diçirise.

Silêmanî 1940

-Badîn, inkar nabe, çavên te bi heft dangan dibêjin em  
aşiqin.

Nûrî Emîn ji min re got û li çavên min nihêrî. evîna ku  
min dixwest veşêrim, weke Memo çawa Zînê di bin  
ebayê de veşart, mezintir bû ji nuxumandinê, çavên min  
jî Beko Ewan bûn ji Nûrî re ta bi derziyê ve kirin. bêçare  
ez mukur hatim:

-erê ez jê hez dikim.

-ji mêj.?

-ji wê sersala çûyî ve.

-ew ne layiqî te ye Badîn.

-çima?

-ew keça Kawlê Xanim e.

-Kawlê Xanim kiye?

-bibihîze.

û tûrê çîroka diya Jale li ber min vala kir.

\* \* \*

jineke ciwan bû, ji roniyê hîvê û tayên berbangê hatibû  
ristin çermê wê, li gorî dibêjin, tiliyên wê ji mûman jî

nazik tir bûn, û bejna wê !! minareyên camiyan çine!?  
brûskek bû xort gêj û teles dikirin. jin û bûkên Silêmaniyê  
ew kiribûn pîvanû terazû ya ciwaniyê, hîn pesnê wê di tu  
helbestan de nehatibû û ne dihat kirin. tu kesî jî nizanî  
57

bû ew perî ji kîjan bihiştê reviyaye, şairên navçeyê  
nîvdînî kiribûn, navê wê Hadile bû, ji ciwaniya zêde kesî  
ne diwêrî wê bike jina xwe, Hemzeyê Paştmalî ji êla Caf  
ew anî, Paştmalîyan xwe jê bêrî kirin, lê çi xema wî bû  
!?ew firişte di hemêza kê de bûya pîr ne dibû. dibêjin  
dema zewicî çil rojî ji mal derneket, ne ji fediya xelkê, lê  
ji Hadile têr nedibû, sala 1914 an hat û şerê mezin dest pê  
kir, Cendirmeyên Osmanî di serê her kolanekê de  
vewestiya bûn, dinya havîn bû û bi sedan xort û keçik ji  
drûna genim û ceh vedigeriyan , Cendirmeyan weke  
darkerên êzingan ji bo ardû bicivînin xort bi qeflan  
digirtin, serê singûyan dixistin newqên wan û ew  
dihajotin eniyên ne vegeerê. Hemze di nav lepên  
Cendirmeyan de weke gayekî ku serjêdibe dioriya, wî  
dizanibû ji çi bihiştê tê bidûrxistin, Hadile weke jinên  
wefadar çend mehan xemgîn ma, yan weha xuya dikir,  
xwê ya hêviya vegeerê roj bi roj di ava dilbijokiya wê ya  
germ de diheliya , wê demê tu kesî nizanî bû eniya ku  
kurê wan lê şer dike li kîjan welatî ye.

Ez serê te neêşînim, salek derbas bû Hemze venegeriya.  
Salin zor û dijwar bûn, dê weledê xwe dihavêt, Hadile jî  
ciwaniya xwe nas dikir, ciwanî jî xefka xwediya xwe ye,  
berî ku bibe xefk ji dînen weke te re, û Hadile kete pirrik

û gilav a gunehan. Bi Mecîdiyê tenê, serbazekî  
Osmanî dikarîbû agirê hinavê xwe di berfa sînga wê de  
vemiranda.

Piştî wê bi efserên Osmaniyan xurt bûbû, kesî nediwêrî bi  
quncê çavan lê binêre, xelkê di nava xwe de navê wê  
kirin: Kawlê xanim.

Dema Ingilîz hatin ew bêtir har bû, Majur Son bi xwe  
bûbû yarîkê wê, serbazên Ingilîz, hêzên Lêvî û şebane  
yên Asûriyan, tîbûna navranên xwe li ba wê dişikandin,  
koçerên Ereban jî pezê şehweta xwe di berriya navlingê  
wê de diçêrandin, kes nema û hespê xwe ne ajote wê  
58

axurê. yekî ji êla Paştmales rojekê çû ku wê bikuje, lê du  
serbazên Hindî bi çaplê wî girtin û lingê wî ji lêdanê  
werimandin, ew sirgûnî Besrayê kirin, êdî kesî nema  
wêrîbû navê wê bîne ser zimanê xwe.

Sala şêx Mehmûd bû melik, ew hate kuştin, kes nizane  
Hemze ji ku vejeriya, û kê ji wî re çîrok got, ro li nîvro  
tivinga xwe derbasî nav lingê wê kir û sê gulle berdane  
hinavê wê.

-ma tu têr bûyî!?

Hemze bi dengêkî dîn got û tivinga xwe avête ser termê  
wê, berê xwe da deşta şarezorê, piştî demekê, xelkê  
termê wî di çemê Sîrwan de dîtî, xwîna Kawlê xanim ya  
ku pijiqî bû ser rûyê wî hîn zuwa nebûbû, Jale wê çaxê  
zaroka şîr bû, dema şêx Mehmûd bûyer bihîst, Jale  
teslîmî maleke Hewramî kir, ew heta berî sê salan li  
Helebçe dima.

-Nûrî tu dixwazî bigihîjî çi encamê?

-koka Jale ne paqije.

-Çî min û koka wê!!

-so heta neviyê heftan diajo.

Ez hêrs bûm û min ji Nûrî re got: tu mirovekî komonîst  
î!!çawa weke gundîyan difikirî? ne divê em civakê ji  
zingara ramanên kevn bişon, eger em ji xwe dest pê nekin  
wê kî xwe bike qurban Nûrî.!!?

Nûrî hinekî bêdeng ma, lê weke ku bersiv amade kiribe  
got:

Badîn ez ji bo te dibêjim, mesele ne gundîtî û pêşverûtî an  
paşverûtî ye, ev keçik doxîn sist e, wê bibe lekke ji te û  
partiyê re, tu ne mulkê xwe tenê yî Badîn.

Min guh li Nûrî nekir, hezar partî û milyonek endam bi  
qurbana evîna min bin, min weha di dilê xwe yê ker de  
digot, xefkên evîneke xedar, diranên xwe di dilê min î  
terr de bi çikandibûn, ez masiyekî dil ketibûm çengelê.

59

Rojekê Jale hat û bi ser min de giriya, Pîremêrd ew ji  
rojnameyê bi dûr xistibû, min nema bawer dikir roj biçê  
ava, ku herim Nûrî li çayxaneyê bibînim, min xwe  
ranegirt, ez bi lez çûme mala wî, hîn li ber derî, ji min re  
got: te bihîst Parîs kete destê Hitler? Niha serbazên Alman  
di çemê SIN de avjeniyê dikin.

-xwezî werin Bexdayê jî, min bi kerb got. wî ez derbas  
kirim û pirsî: çima Bado? Çi bûye? Tu ne li ser hev  
xuyayî?

-bo çi Jale ji rojnameyê derxistin?

-wisa bibêje Bado Efendî, min nizanîbû Jale ji Parîs  
pêwist tire.

-bê qerf, tika dikim Nûrî bersiva min bide!

-hawrêy ezîzim!Jale têkiliyan bi inglîzan re datîne, ew li  
kluba efseran hatiye dîtin.

-ne raste.

Lê rast bû, û rastiyeke weke xençerê bû min daqurtand,  
Nûrî got: were em wê bipên, û em herdu, weke dizan di  
tariya şeveke Silêmaniyê ya tîr de, ketin kolan û zikakên  
teng heta em ghiştin kluba efseran ya li tenişt dibistana  
seretayî ya cihûyan, dengê Frank Sinatra ji kûrahiya klubê  
dihat, dilê min hindik ma bû ji sînga min bipeke, ji nişka  
ve çavên min li otombîla (HAMBER)ya kapten Mc kay  
ketin, Jale li rex şofêrê Hindî weke durdaneyekê dibiriqî,  
nizanim çi bi min hat, nizanim min çi got, nizanim çawa  
em vegeeriyane mal, çi birîn bû di dilê min de dîlan  
gerand? hetwan nebûn tê bidim, ew birîneke ji dilê min  
jî mezintir bû, ez nema tebitîm, min kir û ne kir ku wê  
şevê bi meyê kin bikim, min nikarîbû, stirîyek bû û di  
nîvê dilê min de çikiyabû, Nûrî qala wê û Goran kir, got:  
wî jî weke te dilê xwe bi dû wê de aware kiribû, Jale li  
dibistaneke Helebçe, ku Goran lê mamoste bû, dixwend,  
wî navê wê kiribû Aştara Hewraman, roj nediçû wî tenûra  
dilê xwe bi helbestekê li ser ciwaniya wê danedabûya,  
60

Jale Goran û Helebçe li pey xwe hêlan, helbestvanê  
diltenik çare ji bo rizgarkirina dilê xwe yê zindanî nedît,  
ji bilî çûna Filistînê, ew di radyoya El şerquledna de bû



nûçebêj, ma qet te nebihîstiye bê çendî nûçeyên ew diweşîne bi şewatin? Ma tu stranên Frank Sinatra nabihîzî ku her roj ji wir têne weşandin.?

Nizanim wê şevê ez li ber dilovaniya dengê Nûrî, yan ji giraniya serê xwe û mestbûna ji meyê, ketim xeweke weke mirinê, sibehê li ser xirecira dengê zarokên taxê ji xew rabûm, dilê min bi destê min girt û ez ajotim navenda ku rojnamevanên Jîn lê kom dibûn, Jale li wir bû, çavên wê kujûlî bûbûn, gîsnên bêxewiyê rûyê wê yê aram û hevirmêşî cot kiribûn, bê (Beyanît baş) min bi kerb got: tu duh li ku bûyî.?

Tûrikê derewan tim li milê wê bû, min jê hez dikir, ji derewên wê jî hez dikir, dilê min minalekî pêxwas bû , bi kêf û şahî li şiverêyên derewên wê yên bi stirî dibezîya, heta roja îro jî xwîn ji dil diniqute! Lê wê carê min dixwest ez wê ber bi xefka mukurhatinê de bidehfînim. -ez li kluba Efserên Ingilîz bûm.

-morîkên diya te li wir qetiya bûn!?

-Bado...giyanim, hêrs nebe, û bila xeyalê te dût neçe, min ji kaptan Mc Kay xwest ku min li rojnameyê vegeirîne.

-maşella!! kaptanê te nikare Parîs jî li Dîgol vegeirîne, nikare destên xwe bide ber bombeyên ku bi ser London de dibarin jî?! kes nema bû bibe ricaçî û tikadar ji wî fîlê Ingilîzî pêve.!!

Ez gelekî tengijîm, ronî di çavên min de nema, lê çî bikim, dîsa jî ez tê nebuhrîm, min nedixwest ew kevok yek car biterqe, min ew kedî dikir da ku her li ser terhên dilê min yê ker veniştî be.

\* \* \*

-Ezê biçim Bexdayê.

61

Jale di destpêka payîzê de, ev bombe di dilê min de teqand.

-ez êdî ji vir nefret dikim, tu jî her û her min dipêyî,  
baweriya te nema bi min tê, Silêmanî bîna min diçikîne,  
ez dixwzim li Bexdayê beşê edebiyata Ingilîzî bixwînim,  
lê nebêje ji ber min bazdide, na...ezê her nameyan bo te rêbikim.

Çend meh di wê navê de çûn, nameya ku ez li bendê bûm hat.

)Merheba badîn...binêre ez wefadarim, min tu ji bîr nekirî, lê bibûre, xwendinê wexta min tev ji min standiye, zimanê Ingilîzî jî bi qasî ku xweşe, zore, lê ez berê jî hinekî dizanim, îcar ez gelek zehmetiyan nakişînim, te ev ziman zanîbûya minê ji te re name pê binivîsandana.

Min bêriya te kiriye, lê dilê min û hatina Silêmaniyê nîne, ez wê weke goristana hestan bo xwe dibînim, Bexdad bajarekî mezine, gelek Kurd jî lê dijîn, hin dixebitin, hin dixwînin, hin ji kevin de malbatên wan li virin, lê têkilîyên min bi wan re nînin, tev gundîtî bi wan re heye, serêşiyên ji mirov re çêdikin , wê nameyên min bi derengî werin , îcar li hêviya wan nemîne, lê eger tu dixwî nameyekê bihinêrî li ser vê navnîşanê rê bike:

Bexdad-Dar Elmuellimîn

Qism El luxe El ingilîziyye. . . . JALE.(

Ez westiyame, pêçiyên min ji nivîsandinê diarihin, ez

dibêjim hindik maye movikên wan ji hev bikevin, ezman  
kirasê xwe yê tarî û bi stêrkan xemilandî ji xwe dişeqitîne,  
kirasekî lajewerdî li xwe dike, reng di vê berbangê de têne  
guhertin, weke siyasetan, kê gotiye ezman jî ne  
siyasetmedareke!! çîroka Jale zû bi zû naqede, ma kî  
dikare şewata dilê xwe bîne ziman!?

\* \* \*

Silêmanî 1941

62

Du sal buhurîn û ceng ranewestiya, li ezmanan balafirên  
Leftwaf û Stoka yên Almanî, B17, B25 yên Emerîkî,  
Lankister yên Ingilîzî, Zero yên japonî, bi milyonan jinbî  
û sêwî li erdê diçandin, Rûsya û Ingiltere ji xwe re Iran  
weke zebeşekî parçe kirin, Almanan jî bi devekî girêzî li  
petrola rojhilat dinêrîn, guhên xelkê weke paçikan bi  
radyoyan ve hatibûn dirûtin, dilê min jî li ber bayê  
Bexdayê dihejiya.

Di civînên Hîwa de, gelekî behsa (fersendên dîrokî) dibû.  
dema piling û şêr radibin hev, çend hestî ji lawirên mayî  
re jî dimînin. Refîq Hilmî di civînekê de weha got.

Dem wek çemekî qîrê, giran dimeşiya, min wexta xwe bi  
xwendina rojnameyan, çûna çayxaneyê, civînên Hîwa  
derbas dikir, lê ez weke gêjan bûm, nameyên Jale ji nişkê  
ve qut bûn, min roj disipart rojê, û dilê xwe yê miçiqî bi  
hêviyan avdida.

Nakokî di hindirê Hîwa de weke dobelanên piştî tavên  
buharê, hilpekiyan, çend kes hebûn, dixwestin serêl û  
giregirên eşîran jî tev li Hîwa bibin, lê Refîq Hilmî qebûl

nedikir:

bila herin beşdarî Komeley Birayetî bibin, şêx Letîfê  
Berzencî bi zimanê wan dizane, partiya me ya rewşenbîr  
û karmend û efseran e, serokên eşîran herin bihiştê jî, wê  
genî bikin, eger werin ba me, wê nakokiyên xwe jî bi  
xwe re derbaskin, ew li ser mêrg û çîmenên herêmê li hev  
nakin, wê çawa li ser siyasetê li hev bikin.?

Min bêriya Jale kiribû, lê Dînarên ku min bigihînin Bexdê  
bi min re nebûn, min bêtirî deh nameyan jê re hinartin, lê  
weke tu wan berdî binê bîrekê.

-çend rojan name ji Bexdê digihin Silêmaniyê?

-çawa wê nameyek, bi lez bigihê Bexdayê.?

-gelo yekî navnîşana xwe guherandibe çawa dibe?

-eger name negihê, li xwedî vedigere an na?

63

Min postaçiyê reben bi pirsên xwe bêzar kiribû, çav li min  
diket, nema zanî bû xwe têxe kîjan qulikê, rojekê di rûyê  
min de qîriya:

-te gunê min dîtine?! Û destê xwe avête nav ranên xwe.

Min nizanîbû ez çi bersivê bidim wî, bi devekî ji hev û  
bêyî ez zanibim çi dibêjim min got: Na.

-ê nameyên tu li bendê jî nabînî.

Dawiya Nîsanê, êvareke bédeng, xortek ji Bexdayê  
hatibû, govara Gelawêj ji min re anî, dema min ew vekir  
nameyeke Jale di nav de bû:

)Merheba Badîn

sersariya min bibûre, dibe ku ev nameya dawiyê be, li dû  
imtihanan ezê vegerim Silêmanî, xwendina min rind e, ez

ketim cîhaneke toreyî pirr fereh û xweş, helbestên Bayron,  
Tenisson ji xweşiyê nayên pesindan“min parçeyek ji  
helbesteke Lord Bayron wergerandiye, di dawiya nameyê  
de ye“ nû min nas kir Goran ê me van helbestên xwe ji ku  
tîne, duh ez çûm min ji şirketa Beyzafon qewaneke Frank  
Sinatra kirrî , ez li ser baskên dengê wî difirrim û diçim  
ezmanekî nenas. Bexda aloz û li hev ketiye, qala Reşîdê  
Geylanî tê kirin, yek caran ez li kenarê Dicle seyranê  
dikim, di ser piran re diçim û tîm, bi vê nameyê re min  
hejmarek Gelawêj bo te rêkiriye. Jale. Bexda. . . . .  
.( 10-4-1941

Çi nameyeke sar!!! lê dîsa dilê min vexist, şepol û pêlên  
ku aram bûn, bi yek carî di dilê min de kirin xumexum,  
ez dişewitîm, agir bi giyanê min ketibû, Jale behsa  
Reşîdê Geylanî dike! Ka evîn? Ka ez ji te hez dikim?  
nameyeke weke qeşayê sar, weke kevirekî zuwa û hişk,  
bê hest û bê dil! nameyeke kerr weke goreke wêran, lal  
mîna şevên serê çiyân.

\* \* \*

64

Roj mîna daneyêke sor, ji milwanka aso kete pişt çiyayê  
)Lendî şêxan), kenarên ewran weke balindeyin efsaneyî  
baskên xwe weke terîşên agir li rojava vegirtibûn, li herdu  
rexên şeqamên ku Çarçira dilê wan e, xelk weke rêzikên  
mûriyan diherikîn Merkezî ferheng.

-konsera Mihemed Mamlê ye.

-Pêşewa bi xwe hazir e.

-Mele Mistefa jî li wir e.

xelkê di nav meşa xwe ya bi lez de ji hev re digotin.  
Ez û Mujde li rêza dawî rûniştibûn, ji me ve, serê Qazî  
Mihemed bi şaşika xwe ya berfînî, Mele Mistefa bi fêsa  
xwe ya leşkerî, di rêza pêşî de xuya dikirin, weke bayekî  
çiyayî dengê Mamlê dikewkibî, strana Miryemî Sablaxî  
digot. gurmîna defê, tingîna sîtarê, tev li nalîna bilûrê  
bûbû, roniyeke melûl rûyên kesên rûniştî zerhimî kiribû,  
destê Mujde yê nerm weke kevoka kedî di nav destê min  
de bû, wê hinekî destê min guvaşt, pişt re destê xwe bi lez  
kişand û porê xwe yê weke şeveke havînê kin ji ser rûyê  
xwe da alî.

-Mujde tiliyên te nazikin, lê tiştêk ji wan kême.!!

-Çi?

-xeleka nîşaniyê!!

Wê bi fedî serê xwe xiste ber xwe û di guhê min de got:

-hîn zûye.

Konser qediya, Mujde ya ku xelkê bala xwe neda bûyê ku  
em li rex hev bûn xatir ji min xwest û dîsa bi dengekî  
nebihîstî got: ji bîr neke sibe min bibe studyoya kalkê  
xwe.

Di derketina me ya bi kêf de, ez pêrgî Nûrî û Mistefa  
Xoşnaw bûm, min ew dawetî mal kirin, lê wan lêborîn  
xwestin: divê em îşev li Urdugeha Serbazxane bin,  
efserekî Rûs mêvanê me ye. Ji nişkê ve Kerîmê Şikakî di  
ber min re derket, min di guhê wî de got: lîtrek Vodka li  
hêviya me ye!

65

Em ketin rê, bîna kulîkên çiyar fesadiya buharê dikirin,

şar bêdeng bû, û rûyê Kerîm tirş bû, dema em nêzîkî  
meydana Çarçira bûn, weke tişteke were bîra Kerîm,  
rawestiya û got: Badîn tu hay ji xwe nakî!!

-çima?

-bibûre lê rûniştina te li rex Mujde ne durust bû!! Tu  
dizanî ev Mehabad e û keç û xort ne ewqasî serbestin hûn  
jî ne tişteke hev in.

Ez di cihê xwe de sar bûm û nema min zanîbû çî bibêjim,  
û nizamim min çî got. Kerîm ji nişkêve ew bombe teqand û  
ez ne amade bûm, rûyê min sor bû û min bi hêdî got: em  
dixwazin bizewicin.

Û di bin ronîya çirayeke xemgîn de em ji hev qut bûn.

\* \* \*

Mujde dibistan û dersdanê hate şemirandin.

Xeyda Kerîm ne bes bû mudîrê dibistanê yê Mehabadî jî,  
ez û wê ji hev bi dûr xistin, wî got: nabe hûn tim bi hev  
re di hewşa dibistanê de diçin û tîn, ev ne xan e, ne jî  
kolanên parîs e. qutabîyan tê derxistin ku bûyerekê ez  
dilteng kirime, yekî ji wan (Rehmanê Germiyanî) îro ji  
min pirsî: mamoste çî heye?

-wê birêz Menafê Kerîmî were da ku çend qutabîyan  
hilbijêre ji bo wan bişînin Bako yê. weke min berê ev  
bersiv amade kiribe min got.

Û bi rastî jî Menaf li ser dibistanan digeriya, lê qutabîyên  
ku rêya Bako yê li ber wan vebû, ji malên begler û...

Çî min û vê yekê!! ez di derdê xwe de bim çêtire, dilê min  
weke gogeke ji agir di zadê temenê min de digindire,  
keleşêrên Mehabadê dixwazin tariyê di Sablaxê pirrbêj de

wer kin, gelo mirîşk nayên bîra wan? Gurmîna tava ye,  
birûsk vedidin weke şoreşên Kurdan, di nav tav û  
birûskan de axaftineke nayê famkirin dibe. Pîrka min  
digot: birûsk qamçiyên milyaketên baranên ne, dema  
ewr xwe bêcîrr dikin , li piştta wan didin heta agir jê  
66

dipeke, ewr diqîrin û hêsir bi çavên wan yên nedîtî  
dikevin!!

Di pencereyê re li derve dinêrim, bi ronîya her birûskekê  
re dêlîya tirî weke sêwiyekî rût di bin şirrikên camiyan de  
rawestiyaye xuya dike. ez û xewê hev bi werîsekî nediyar  
dikişkişinin, ew hinekî zora min dibe û min bi alî xwe de  
dibe, lê ez xwe dispêrim janên xwe û werîsê nediyar ji  
dest distînim.

Ku şev dereng dibe, mirov êdî ne bi hacetî xewê ye ku  
xewnan bibîne, xewn bi xwe tên li dora yekî çirvîtkan  
didin, çav vekirî, hiş li serî , mirov xewnan dibîne, ma  
xewn bi xwe çine? Jiyanek bervajî, weke tejikekê, hişyarî  
nahêle kes rûyê rast yê wê tejkê nas bike.

\* \* \*

Ezê bizewicim.

Dema berî mehekê min ji kalkê xwe re got, ji min nepirsî,  
çavê te di kîjan keçê de ye, tenê gote min: ji Mele Mistefa  
re bibêje, Mele Mistefa jî panzdeh dînarên Iraqî xistin  
destên min û got: ev sê sed Tûmenî dikin, li xwe û  
destgirtiya xwe xerc bike. wî jî nepirsî kiye?

Tenê Nûrî, dema min biryara xwe jê re got, pirs kir:  
ê .. lo, ev Mujde çi kese?



-Çi kes e.?

Min ev pirs ji xwe ne kir, min ji Mujde jî tucarî nekiribû,  
kî be, ji ku be, ne xema min e. ez wê nas nakim, lê dil  
wê nas dike, min berê nepirsî Jale jî kiye?. evîn  
bersiveke ciyê pirsan tê de nîne.

min ji devê Kerîmê Şikakî berî ku ji min bixeyide û ji  
gotinên Mujde yên qetqetî, çîroka wê naskir, ew keça  
XOYBÛN e, keça Ararat e, keça berf û xwînê ye:

\* \* \*

her ku şevê li deşta Bayezîdê, bersivên xwe ji pirsên  
stêrkan re radixistin, Mujde ya çarsalî ji diya xwe dipirsî:  
-bavê min li kuye!?

67

-keça min, tu wî çiyayê porsipî dibînî? bavê te li wir e.

-çi dike?

-berfê dihelîne.

-çima.?

-ji bo em ji serma re nemirin.

Zivistana 1930 bû...

Bavê Mujde(Zilfoyê Celalî) her şeva îne dadiket bajêr,  
xwe radida bin lihêfa germ ya jina xwe, li keça xwe ya di  
xewa şêrîn de dinihêrî û digot: şerê ku li jor dibe, mirov  
ji mêranî dixê.

êvarekê hat , çend kaxezên pêçayî şil di paşila wî de bûn,  
çaxa jinika wî qapûtê wî yê giran bi darbenê ve kir çav li  
wan ket, pirsî: ez benî ev çi kaxezin?

-ev qezeteya Agirî ye, binêre Ihsan paşa çi nivîsiye!!

-lolo lêlê.....ez rebena xwedê çi xwendinê zanim!!

Ihsan paşa hêviyên xwe -weke qapûtekî leşkerî- bi her darbenekê ve dadiliqandin, Ermenên Taşnaq, şahê îran, Kurdên Sûrî, êl û eşîrên mezin, bi berfa Aigrî ya ezêlî, ew berfa ku tofana Nûh çiqasî bilind bû jî, ne ghiştê. Tirk artêşeke mezin amade dikan, şêst hezar serbaz, heft sed metralyoz, pêncî topên giran, sed balafir, eger êrîş bikin, wê ev berf bihele, û deşta Bayezîdê di tofaneke nû de bixeriqe. cengawerekî tirsîyayî ji hevarekî xwe re digot. -dîno...bila dunya hemû were nikare zinarekî ji vir bileqîne. Hevalê wî yê ji xwe bawer, lê veğerand. şapên berfê ji lûtkeyê efsaneyî diqetiyên û dihatin xwarê, bi gurmîneke weke ya tavên nîsanê digindirîn. -hema ji tirsî van şapan, wê Tirk... gotin hîn nîvco bû di devê şervanê ji xwe bawer de, hevalê wî qêriya: Xwe bide alî. Lê şapeyê ku ji hezar gaz jorayî dihate xwar, ji qêrîna wî bi lez tir bû. -hey berfa xayin! Bi devekî tijî berf şervanê ku bûbû gulokek berf û dihate xwarê got.

68

\* \* \*

Bayezîd Nîsan 1930.

-bi lez karê xwe bike, buxçeya xwe girê bide, ezê we bibim Xoy.

-xêre ezbenî, çi bûye?

-wexta min û bersivan nîne, zû keça xwe hilgire, du qantir li hêviya me ne.

Bavê Mujde (Zilfoyê Celalî) bi rûyekî tirş ku layiqî

şervanekî Agirî ye, buxçeyên bi lez pêçayî, li qantirekî şidandin, keça xwe û diya wê li qantirê dî siwar kirin, û di wê şeva bêhîv û bêhêvî de ji Bayezîd derketin.

Kerîm wisa bûyer digot:

Dema bavê Mujde (Zilfoyê Celalî) ghişte Xoy, di serî de berê xwe da mala min, em ji kevin de dost bûn, Almanan karxaneyê xaliyan li Tewrêzê ava kiribûn, belengazên Kurd hirî ji Şino bar dikirin û qûtê roja xwe derdixistin, ez û wî jî em deh duanzde salî bûn, me hirî dixiste bendekan û yên ji me mezin tir ew li qantiran bar dikirin. Çend rojan jî ez di karxaneyê de xebitîm, min mûyên zêde ji nava hirîyê vediqetandin. Lê çaxa Rûs ketin Tewrêzê ew karxane rawestiya, ev çîrok berî cenga yekem bû. bavê Mujde (Zilfoyê Celalî) vegeriya Bayezîdê, lê her buhar dihate nav Şikakan, dilê wî ew diajot, yeke Şikakî hebandibû -rehmetiya diya Mujde- tu dizanî qelenê wê çi bû Badîn?! Sê tivingên Berdan yên nû, sê beranên qer û sê sal alîkariya Şikakan di talankirinê de.

Êvareke xemgîn bû, bavê Mujde (Zilfoyê Celalî) qîza xwe ji ser qantira lawaz peya kir, eniya wê maç kir û gote min: Kerîm can, ez vê keçikê dispêrim comerdiya te û dilovaniya xwedê, ez hatim hatim, nehatim jî tu xwediyê wê û diya wê yî, û rişma hespa xwe bada.

keçika wî çarsalî bû, rûyekî gulover, genimgûn, şêrîn û xwîngerm, pozekî qut û çavin hûrik wek du stêrikên piştî

69  
rojawa, her çaxa min jê dipirsî : bavê te li ku ye? digot:  
berfê dihêlîne.

Kêşeya Kurdî di wan salan de bi hezar girêkî bû, hezar şeytan li girêkekê biciviyana venedibû, şêx Ehmed li Barzan, şêx Mehmûd li Silêmanî, Ihsan Nûrî Paşa li Agirî, Simiko li Ormiye, her yek coyek bi tena xwe diherikî, her çiyayekî strana xwe ji newal û geliyên xwe re dikir, dengê kesî ne diçû kesî, Havîna wê salê, aşê serhildanê betal bû, weke noka li kevir bikeve, cengawer belawela bûn, dojehek bû û xewn û hêvî tê de hatin biriştin, her sibe diya Mujde li ber siya dîwarê xaniyê me rûdinişt û digot: wê bê, min di xewnê de ew dît. Lê nehat, tenê hayê min û berfa Agirî jê hebû ka çi pê hatiye.

\* \* \*

Bi dasên bêxewîyê  
zadên bîranînen xwe yên bê kevî diçinim.  
ey dema zikreş û bêcirr  
de biçîne, van birînan di zeviyê temenê min yê beyar û  
wêran de.  
vaye dîsa weke sofiyekî di xelwetgehê de  
ez bi ser berfa van rûpelan de xwar bûme  
pênûsa min ya ku weke hespekî li bîranînan dilikume  
di nav tiliyên min de xilmaş dibe.  
ji henasên min yên dogehîn diqemirin rûpel. eger ew  
zanibin çi li ser wan tê nivîsandin, wê bişewitin.  
Hezîran nû ji dara salê weşiya bû, palevanên deşta  
Helebçe, êdî komkirina sapên genim jî qedandibûn,  
pirêze dihatin şewitandin û kerîyên pez tê de diçêrîyan  
Reşîdê Geylanî ji Bexdayê reviya Almanya, Ingilîzan dîsa

destên xwe xistin qirika wan bajar û gundan, dîsa şêx Mehmûd berê xwe da Silêmanî, şêrek bû li şêrgeha xwe vegeriya.

70

Komonîstên Iraqê ji partiya Hîwa nefret dikirin, gelek caran em radibûn hev, Stalîn fisek bikira, digotin bîna gulan difûre, ji bo wî bûne alîgirên Geylanî, partiya me jî li dijî wî bû. Refîq Hilmî digot: ev camêr qenc e lê wê bi nezaniya xwe me têxe hemêza Naziyan.

Tu kes bi hawara şêx Mehmûd ve nehat, di civînan de me kumik li hev sor dikir, zengelokên me qetiyên hingî em bibêjin divê alîkariya wî bibe.

Rojekê ez çûme gundê Sîtekê jivana şêx, gelekî bêhêvî bû, teyrekî Baz çavbendekî ji çermê xezalan li çavê wî gerandibû û ew ji nêçîrê re amade dikir, dema naskir ez ji partiya Hîwa me, bi hêrs got: here ji Hilmiyê xwe re bibêje: Ingilîz bi te dilîzin, dilê xwe bi partiya xwe û çend xortên Efendî xweş neke, partiya rast ev e. Ê destê xwe li xençera xwe ya serxwar û kalan ji çermê pezkovî xist. -Ezê vegerim Bexdayê. çi bikim?! Ingilîzan ziravê we qetandiye.

Bi tehlâyîyeke bê sînor digot, û bazê xwe bi dû kew û qitik û keroşkan de difirand.

Jale hîn ji Bexdê venegeryabû, min bi qasî deryayekê bêriya wê kiribû, êvaran guhê min li radyoya Berlînê bû, yek caran min derzî dizîvirand û min li Izgeha Elşerquledna guhdarî dikir. dengê Goran li ser baskên bayê çi xweş dihat, dengê evîndarekî dilguvaştî bû (gelo

Jale jî lê guhdarî dike?) min ji xwe dipirsî. dilê min ji Leningradê bêtir li ber xwe dida.

Dawiya Temûzê bû, terhikên daran di bin giraniya meyweyan de çimiya bûn, dilê min jî weke Biyokeke stewiyayî, dihat ku were xwarê.

şevê, min dastana Pîremêrd ya li ser dwazde siwarên Merîwanî, dixwend. Dengê nermik ji deriyê min hat. Jale bû.

Hestên min yên wê katê nayên ziman. Weke minalekî ez giriyam, ne girî bû ew. orîniya berxekî bû ku ji dayika 71

xwe diqete û serjêdibe. min ew hemêz kir û serê xwe yê şêt li ser singa wê danî. Hêsrên min bi ser ala Ingiltere ya li ser gumlekê wê herikîn, wê bi sarbûneke kevirî got: çî bûye Bado!?

Çî bûye?! Çiqasî pirseke pûç û xav û bê wate bû wê şevê, çî qasî pirseke xençerîn bû ku kezeba min qelaşt.

-çî bûye? Malwêran ev çend mehin ne nameyek, ne telegrafek. ne xeberek. ez di agirê xwe de dişewitim, tu jî sar mîna ku bavê te qeşa be, diya te berf be, ez ji te hezdikim, hezdikiiiiim.

Dengê min yê sêwî, wê şevê li şeqamên Silêmaniyê zîzikî )hevalên min, roja din sibehê , heta yên li taxên dûr mîna Serçimîn û Kanî Askan gotin: me qêrîna te bihîst, mîna yekî ku rehên dilê wî biqetin.(

Jale li ser sofayê rûnişt, lê deng jê nedihat, ez li ber wê serçok bûm û min bi niyaz got: Jale em bizewicin.

Bersiv neda, lê rabû ku biçê, min bi dengê dîn got:

eger tu biçî ez xwe dikujim.

Ji gefdana min bawer kir û neçû, bû mêvana nivîna min, ramûsanên me sar û xav bûn, yê wê ne yê min, lêvên min bi xwe bûbûn agir û bi bedena wê ketibûn, diranên min bûbûn gîsn û zeviyê wî laşê ter û nerm û spî cot dikirin, ez çî cotyar bûm wê şeva gawir.

Emîral Axa, carekê got: hûn dizanin Sablax çiyê? Ew ne cobar û çem e, berê ew mirovekî evîndar bû, ji kerbê yareke xayin heliya û her û her diherike.

Ez nebûme çem, lê di dilê min de, teqiyana hezar kaniyên jan û hesretan.

li kolana Kanî Askan, li ber deriyê Mizgewtî şêx Selam, piştî heftiyekê, ez li Jale rast hatim. kitêbeke Ingilîzî di destê wê de bû:

-ev çî kitêbe Jale can?

-romana The (Vergin and The Gipsy) ya D.H.Laurenc e.

72

-min texmîn dikir te dîwana Herîq ji çapxaney Merîwanî ji Bexdê aniye.!!

-ev li ku, Herîqê te li ku?! Ev romaneke ecêb e. ez bawer nakim Kurd karibin tiştê bi vê sewiyê bînin meydana edeb û wêjeyê.

Bi wê gufûgoyê re me nêzîkî li baxçeyê dibistana seretayî ya Cihûyan kir, da ku em ji ber çavan win bibin, em ketin pişt qurmê dareke pîr û min jê pirsî: çima em nazewicin? lêvên xwe qermeçandin û carekê du caran rûpelên romana di dest xwe de qulibandin, serê xwe rakir û çavên xwe di çavên min de çikandin: Badîn em ji hev re nabin!!

Dilê min di geliyekî bi stirîyên vêketî de wer bû.

Çima em ji hev re nabin? Ez xortim, Kurdim, wek geyikekî di nav nivînan de har dibim, di çavên xwe de xweşikim jî, çi qusûrên min hene gelo.?

Jale, weke şehzadeyên kevalên sedsalên navîn, xwe di landika ku bi şaxekî darê ve bû, dihejand, dilê min jî dihejiya, bayê ku ji hejandina landikê peyda dibû, kirasê wê ji ser çîmên şayik û spî dida alî, yek bergên darê bi ser rûyê wê de diwerîyan, bi nazikî dida alî, hêsir bi çavên min ketibûn, wê jî bi çavin nîvgirtî li min dinihêrî, min nizanîbû ew awirên sist çi wateya wane? Gelo dilovanî ye, yan poşmanî ye? Kenekî sivik li ser lêvên wê resim bû ku pê re dilê min dikira bifiriya, lê bi min dikeniya ew sihirbaz, bi dilê min yê ker dikeniya, bi evîndariya min ya dînoke, bi hezkirina min ya xwedayî, bi jiyana min dikeniya wê katê ew bûka berfê.

-zewac fikrek e dûr e ji bo min!

-ez temenê xwe tevî li hêviya te dimînim.

-ez nikarim ji te re bibim jineke layiq.

-tu çawa bî ez ji te hez dikim, hezdikiiiiim.

Û min serê xwe di qurmê darê de lêxist, nizanim çend caran, nizanim çawa, dîtina min dît, ez li odeya xwe, Sadiqê Behaddîn, û Nûrî Emîn, û çend hevalên ji Hîwa,  
73

li dor serê min yê girêdayî civiyane, min çavên xwe li Jale digerlandin, xwîna ku ji eniya min herikî bû, mijangên min bi hev ve dizeliqandin, min nikaribû çavên xwe qenc vekim, Sadiq bi destê min girt û bi ken got: te kortek di



darê de çêkir, ku keroşkek dikare xwe tê de veşêre.  
dilê min û ken nebû wê şevê, xewa min dihat, min  
dixwest xeweke di rengê mirinê de bikim, ji hişê xwe  
herim, yan jî dîn bibim û bi çolan bikevim.

\* \* \*

10Nîsan 1946

Êvare...stêrik dilîzin, ez li ber pencereya xwe ya bi ser  
hewşê de vekirî rûniştîme, bayê ku weke dizan xwe li  
pencereyê dide, perdeya Etlesê şîn direqisîne, herdu  
enîşkên min, şopa xwe li ser maseya ji darê berrûyan  
kolane, di qunceki odeya min de, textê razana min e,  
palgehek ji perîkên deh dîkên qurre, Mujde ew diyarî min  
kiribû, navê min û xwe li ser hêzarê spî bi tayên rengîn  
neqîşandiye, doşeka min ji hiriya deh berana ye, lihêfa  
min çewalek pembo tê de ye, di refikekê de çend kitêban  
wek sêwiyan xwe dane rex hev, ez di xwe re nabînim  
destê xwe bavêjim wan, toz bostekê li ser wan rabûye.  
Dilê min û nivîsandinê, vê êvarê nîne, lê ez xwe bêgav  
dibînim, nizamim çî raz, çî hêz, tiliyên min li pênûsê  
dialînin? gelo ji ber ku ez ber bi mirina xwe ve diçim?! ji  
xwe her kes wehaye, ma kê piştî xwe daye mirinê!! tu kes  
ji derve yî xeleka wê najî, ezê binivîsim, tenê nivîsandin  
zora mirinê dibe.

Berî çend rojan Nûrî Emîn hat, xatir ji min xwest û bi  
devekî li ken got: emê biçin bakurî Seqizê, siwarên Şikak  
û Herkiyan jî xwe amade dikin, komar wêneyeke ciwan e,  
lê çarçov biçûk e.

Kake Axa (bi xwe efserekî ji Soveytistanê ye, Azerî ye,

navê wî Selaheddîn Kazimof e, li vir bûye Serheng(

74

pêşmerge, baş fêrî xebitandina tiving û avêtina Narincokan  
û meşqên şer kirin, hinek jî fêrî ajotinê kirin, qişle yên  
kevin, yên artêşa Îranî ji nû ve ava dibin.

Mehabad hindik maye bibe urdugeheke Rûsan, kalkê min  
dibêje, binêre Badîn, her kes kincên xakî li xwe dike,  
terzî nema di ber re digihin, pêçiyên terziyên Mehabadê  
tevizîne, ba ketiye kabokên wan, stûyên wan xûz bûne,  
hingî bi ser wan topên cawê ku ji Bako yê tê de xwar  
dibin.

Tê gotin ku wê Pêşewa biçê Tewrêzê, Azerî xwe bêcîrr  
dikin, çavê wan li wê yekê ye, ku Ormiye, Xoy, û  
Miyanduabê daqurtînin.

Dêlîya tirî hîn di xewa xwe de ye, hay ji biharê nîne , tu  
dibêjî qey zivistanê di qurm û reh û şaxên vê darê de, xwe  
ji bîr kiriye. Silêmanî dîsa weke kewekî nêr û bi  
qebqebeke bilind dikeve xefka xeyalê.

Sala hezar û nehsed û çil û sê bû, dawiya Temmûzeke  
germ, Jale çû, bû gulokek berf û li ser agirê dînbûna min  
heliya, xewnek bû?. . na.. . rastiyeke bû? Na...çi bû ?! çû û  
ne kir ku paçekî li serê min yê birîndar bigerîne, serê  
birîndar!!! Tê çî ji dil re bibêjî?! tenê parçekaxezek li şûn  
xwe hêla bû, têde : (I am sorry) nivîsî bû. ew dînbûn, ew  
evîn, ew maç û mûç, ew dojeha sor, bi sê peyvên Ingilîzî  
bi dawî bibin!!!

Ey xwedayên tolhildanê, li ku ne hûn?

Ey şepolên kîna reş.

Bişon vî dilê wêran.

Ji wê evîna wêran.

Piştî çûna Jale, ez li civînên Hîwa weke telesan bûm,  
awirên min li dîwaran dilikumîn û hew radibûn. Nûrî  
Emîn bala xwe dida min bi destê min digirt û di kolanên  
tarî yên Silêmaniya xopan de ez digerandim û ber dilê min  
dida:

75

Badîn! heyfa te! Tê ji bo keçekê xwe dîn bikî! Haya te ji  
dora te nîne? Binêre Mele mistefa ji Silêmaniyê reviya,  
filsek pêre nemabû, te bihîst ku Reşadîyên kofiya xanima  
xwe firotin da ku karibe jiyane bidomîne, em li ku tu li ku  
Badîn!! îro doz doza azadiyê ye, hinekî dilê xwe xurt bike.  
-Nûrî, Jale azadiya min e, şoreşa min e, welatê min e  
Jale....û ez digiriyam.

wê demê têkilîyên me û J.K (Komeley Jiyanewey Kurd)  
xurt bûbûn, Mîrhacê Zaxolî çû bû Mehabadê li baxçeyê  
Emînulislam bi damezrênerên J.K re, li bin dareke gûzê  
hevpeymanek li darxistibû.

Ez gelek caran fikirîm ku ji Silêmaniyê derkevim û biçim  
Mehabad, min dixwest dûrî kêra ku dilê min parçe kiribû,  
bikevim, li çareyekê digiriyam ku Jale ji bîr bikim.!

\* \* \*

Vodka....

Xwedê rehma xwe li hestiyê wî kesî bike, ku mey  
afirandiye. Ew çi mejî bû di serê wî de?! bê guman ew  
kes evîndarekî dilşikestî bû weke min, lê ez! ezê çi  
biafirînim ji xeyrî van rûpelên ku dînbûna xwe bi ser wan

de weke xwîna birîndarekî dirijînim.

Ne mey bûya minê çawa derdên xwe bingor bikirana?! Ne şer, ne ne karê di refên Hîwa de, ne jî Mujde karîbûn bibin baranek bi ser agirê evîna Jale de. Tenê ev Vodka ya ku bêdeng di şûşeyê de bang li min dike, min dibe cîhaneke cuda, fereh, xweş, rengîn, cîhaneke weke hemêza Jale (ne Vodka bûya min dê eşkere dijmintiya Rûsan bikira.)

Ji klasa ku ez mamostayê wê me, sê xwendevan çûne Bako: Hesên Husamî, Rehman Germiyanî, û keçek navê wê Hejar Zindî. Ew xwendekarên herî jîr bûn li ba min. ez gelekî li ber Hejarê dikevim, ew qasida navbera min û Mujde de bû (piştî Mujde ji dibistanê çû, û Kerîm xeyidî demekê têkiliya me di rêya nameyan tenê re bû.)

76

\* \* \*

Badîn

Ev nameya yekem e ku di jiyana xwe de ez dinivîsim, bibûre eger gotin têra bêrîkirina min nekin û bi kêrî hezkirina me neyên .bi hêvî me tu dilê xwe ji Kerîm negrî, ew ji min hez dike û ji te jî hez dike lê naxwaze lekke li min bikevin, tu dizanî vir Mehabad e.

Ez nizamim çî ji te re bibêjim! Xwezî ez jî weke te helbestvane bûma, min jî weke te peyv ji şikeftên wan yên nuhênî derêxistana . tu weke marbaza yî, li ser awazên henasên xwe, marên peyvên ji qulikên ferhengan dertînî, lê ez rebena xwedê!! Çî tê ber serê xameya min, dinivîsim.

Çêtire ez ji te re behsa jiyana xwe ya bûrî li Mehabadê bikim, (çi ku fersend ne bû dema me hev didît, ew jî ne sûcê min bû, lê tu... çavên te li min diketin tu dibeziyayî maç û gezan.)

Ezê ji niha de dest pê bikim, ez kevalekî pêşewa çêdikim, ezê wî kevalî li kilasa xwe daliqênim, qutabiyên guhê min birin her dipirsin: ka tabloya Pêşewa?! ha..hate bîra min, ji kilasa min çend qutabî yên ji malmezina bijartin da ku wan bişînin Bako yê, ji ba te jî bijartin gelo.!? Îro bavê çend qutabiyên hatin û gotin: em rica dikin minalên me niha nebin, bila bimîne piştî çinîna ceh û geniman!!!

Min çi digot? Erê, ezê behsa Mehabadê û jiyana xwe bikim.

Giyane min:

Mehabad şarekî cadûkere, mirov rojekê lê bijî, nikare jê hez neke, ez jî ev bûye deh salin lê dijîm, ez gelekî jê hez dikim (lê ne bi qasî ku ez ji te hez dikim.)

77

Sala 1930 bû, Simiko û Xorşîd Axa yê Herkî li Şino hatin kuştin, rewşa min û diya min ne baş bû, Azeriyan jî dev ji me bernedidan, ji xwe Asûrî daweta wan bû. Rojekê Kerîm hat û got: xwe kar bikin, berê me li Mehabad e. Em di şevê e gawir de ji Şino derketin.....

Li Mehabad, em di taxa Xirê de bi cî bûn, ez û diya xwe tenê bûn, Kerîm jî nêzîkî me malek ji xwe re dît, wî em ji tiştê bêpar nekirin, weke bavekî bû ji bo min, wê demê Mehabadiyan ji Şikakan hez ne dikirin (hîn jî wisan e,

bûyerên sala 1922 an ji bîra Mehabadiyan neçûbûn, wê salê Simiko kete Mehabad û şervanên wî şar talan kirin, çîrok dûdirêje). ez bi xwe ji tevgera mêjûyê fêr nakim, lê ez nikarim ji Simiko hez nekim, diya min tim qala xanima wî Cewahirxanim dikir, ew di şerekî de hate kuştin. Min di serî de ne got ez nizanim nameyan binivîsim!!vaye min nameya xwe weke rûpeleke dîrokê nivîsand. Xewa min li ber vî bayê hênik tê tê, dengê hat , ez guman dikim tablo ya min ya nîvco ket, hîv weke guhanê çêlekekê xuya dike. Tiliyên şevê yê reş ronîya wê didoşin, bayê Nîsanê xewa min tîne, bibûre. . ez hew dikarim binivîsim. . .

Te maç dikim. . . . . Mujde

\* \* \*

min jî bersiva vî nameyê şand, li hêvîya bersiva bersivê me.

\* \* \*

Badîn nameya te ghişte min , lê ez ji te rica dikim bi tîpên latînî nenivîse, ez nizanim girêkên wan tîpan verêsim. Bawer bike heta nîvê şevê min nîvê nameyê nexwendibû, xweşîya peyvên te bi wan tîpan diçe, yan min fêrî wan bike, yan jî weke xelkê binivîse.

Te di nameya xwe de nivîsiye: ezê te nîşan bikim! Tu li hêvîya çîyî? Min ji Kerîm re got, tu dizanî dilê wî paqij 78

e,pîroz kir û got hûn dizanin. îca sibe saet çar were Koçey Cûlekan (kolana cihûyan) li ber dikana Îsaqê zêrker.....te maç dikim... Mujde

\* \* \*

îro ez çûme ser sozê xwe, Mujde hîn nehatibû, kêlîkekê li ber camekeya Îsaqê zêrker mam û min li zêr temaşe kir, guhar, milwank, gerdenî, bazin, çavşîn, Mşella û gustîlên bi qaş û yê bê qaş dibiriqîn, dengê wan dihate guhê min, erê zêr jî diaxive, lê bêdeng, biriqandina zêr axaftina zêr e. dengê ji yê zêr xweştir ji pişt min hat:  
-rojtan baş.

Mujde bû, me du xelek standin û çûne studyo.

Kalkê min bi kenekî xemgîn re got : Min zanîbû hûnê werin. . . û derbasî kokşka tarî bû.

Mujde li wêneyan dinihêrî, ji nişkêve destên wê yê wêneyek di nav de lerizîn û hêsir bi çavên wê yê reş ketin.

-Mujde çi bû? çi heye? Li şûna kêfê û ken tu digirî!!

-ev wêneyê taxa Xirê ye.

Min ji dest girt û qenc lê meyizand: taxeke xir û wêran, xanî hilweşîyayî, golên avê li her deverê, gelek kes têde hebûn şerwelên xwe hilmalabûn, hin zarok di destê wan de li ser banan, hin jin buxçeyên wan li ser serê wan û di nava avê de dimeşin, ji sîya xelkê û xanîyan xuyaye roj li ber ava ye.

Bêyî ku çavê xwe ji wêne rakim min pirsî: xuyaye lehîyek rabûye, tê bîra te ew lehî?

-eger ji bîrea kê biçê, ji ya min naçe.

-kengî bû?

-salî Sêlawê bû, berî neh salan, dîya min jî têde çû.

-Te ji min re negotibû!!

-Di nav van rûpelan de çîroka vê lehîya zalim,  
serpêhatîya wê Îna reş nivîsandîye..bixwîne, min digot  
79

belkî em dereng hev bibînin ez dê jiyana xwe ya mayî  
weke name ji te re rê bikim.

Û çend rûpel dane min.

-Bibûrin, çend wêne hene xwedîyê wan bi lez dixwazin.  
Kalkê min bi derketina xwe ya sivik re ji koşkê, got û hat  
li ser kursîya xwe rûnişt.

-wey wey wey...bûka min giriyaye!! Bê guman ev mesele  
ne bi dilê Kerîm e ne!! Xem nake wî li min bihêlin.

-na kalo , ew ji bo sala Sêlawê digirî, dîya wê tê de çûbû.

-ho ho, eger wisa be, salên sêlawê di jiyana min de digihin  
şêstî. Li ber tiştên çûyî nekevin, hûn nûhatî ne.

dengê emîral Axa nêzîk dihat, kalkê min kenîya û got:  
hûn dizanin ev dîn ji nivê aqilmendên Mehabadê zanatir  
e?! wî derd jî naskirî ye, derman jî, lê xeyalê wî pirr  
ferehe, bi du çeng av derya peyda nabin.

-na...oqyanos jî peyda dibin..hûnê bibînin.

Bi vê gotina xwe re Emîral axa derbasî studyo bû, min  
qedeha avê rûkire satila wî û jê pirsî:

Tu li gemîyekê naheyirî?

-hindik maye hûn xumxuma pêlan bibihîzin, lê gemî? Ma  
ne Ermen bin wê kî gemîyê çê bike?!ha...? tu nabînî  
şofêrên Mehabadê hemî Ermenin, ew ji zimanê hesin fêm  
dikin, ne ji şerma bûya wê Pêşewa li dewsa şofêrê xwe  
kak Ehmed, Hagopek yan Aramek peyda bikira! Erê  
Ermenî bi zimanê hesin dizanin, lê Turk bi zimanê agir bi



wan re axivîn, agir zora hesin dibe, ez şaşim Ermenîyê kal?

-Pişt re devê xwe xiste guhê min û got: were mala min, tiştê ez dibihîzim tu jî bibihîze.

Roj li ber ava bû, ez û Mujde rabûn ku derkevin, kalkê min got: kurê min îşev were ba min, ezê Agop jî dawetî mala xwe bikim, du şûşe VODKA jêre ji Yêrîvanê hatine, emê bi wan derîyên dilê xwe li piştê vekin.

-Erê kalo.

80

Min got û ez û Mujde derketin. Bi rê de, berî em bigihin zikaka ku mala Mujde lê ye, wê çend rûpel dane destê min û bi nazikî got: beşekî tehl ji jîyana min, di van pelikan de jî ye, belkî bi kêrî te werin!! Û bi awirin tijî niyaz em ji hev qut bûn.

\* \* \*

Badîn

Dilê xwe xweş neke, ev ne nameye ku tu evîndarîya min têde seh bikî, ev rûpelin ji jiyana min in, mîna kulmek hêsir li ber te rûdikim, weke min berê jî nivîsîbû, ez weke te ne helbestvanim ku zanibim jana di hinavê xwe de bînim ziman, îcar bibûre, eger tu tûşî qelsî û bêkêrîya min hatî. Ez nizanim ji ku dest pê bikim? Ez bûme mîna meşka koçeran ya tijî dew, hema bayek li min bide, xumînî bi min dikeve. Bûyera mirina diya min? mijareke kul û xemgînîyê ye, lê hema tu zanibî başe.

Rojeke îne bû, tu dizanî di wê rojê de, mar postê xwe yê kevin diguherin? Wê rojê xweza bi xwe bûbû marek û

postê xwe diguherî!! Ew berî neh salan bû, Kerîm çûbû camîya Ebbas.

Weke ku bûyer duh qewimî be, li bîra min e. diya min Kalecoş çêkiribû, Kerîm gelekî jê hez dike(bawer nakî jê bipirse!). ew xwarineke Mehabadîyan e, dew tev li rûn dîkin û dikelînin, pişt re pirtik û kurtêlên nan diçinin navê, dibe mîna tirîdê, ew zor zor xweş e, tama wê Kalecoşê hîn di bin zimanê min de ye lê tev li tehma mirinê ye.

Ji nişkê ve ewrin reş ji rojhilat xuyabûn, reş bûn weke ku minalek tenîyê di rûyê xwe bide, min ewrên wisa reş nedîtibûn, tavan kire reqereq, û birûsk har bûn, te digot ezmanê Mehabadê dîn bûye, dihat ku were xwarê, zarok bi kêf derketin pehnavên malên xwe yên kelpîçî, çelpeçelpa lingên wan yê xwas bûn. Ji alî Pirdî Sûr  
81

lehîyeke nayê pesinkirin diherikî, ma lehî bû? Hurrîna deh hezar şêrî, yan gurrîna sed hezar tenûrê bi hev re bû, tişteki xwe li ber nedigirt, Nûh jî xwe nikarîbû ji wê bifilitîne, av di ser Pirdî Sûr û Pirdî Spî re qulibî, her dever bû av, her dever vegeyîya despêka jîyanê li ser rûyê vê erdê!!ez dibêjim dînbûna Emîral axa ji wê rojê de dest pêkir.

Me dît û ne dît mala me tijî av bû, çi mêvanekî xwîngiran bû!? Kurd dibêjin ruh şêrîn e, nizanim çawa min xwe gihande serê ban! min li lehîyê seh fikir,gêj dibûm, ez hatim ku dakevim - şimikên min yên ku Kerîm ji min re ji Ormîye anîbûn, li jêr mabûn- dîya min, nêrdewan di dest

de, qêrîya: porkurrê dînê, tu çi dikî?! Da nekeve.

Nêrdewan siparte dîwar û hat ku hilkişe. nêrdewana ku gazeke di avê de bû ji nişkê ve şemitî û diya min ji ber çavê min winda bû.

Ez li jor bêçare mam, ne dikarim dakevim, ne jî bimînîm, hibrîya diya min ya Mûsilê bi ser avê ketibû.(hêsrana nivîsandina du rêzan, rinandîye, nayêne xwendin.

Badîn.(

Piştî saetekê girrê lehîyê daket û sar bû, weke gayekî girs, piştî ganê ji ser piştî çêlekeke melûl dakeve, berê xwe da çemê Sablax û di hemêza xwe de, gelek pîr û kal û minal û sewal birin. Nizanim çawa ji serê ban daketim û li kolanan aware bûm, pir kesan xwe avêtibûn bextê camî û mizgeftan, ji nişkêve tûşî Kerîm bûm, min bi girî xwe avête hemêza wî û got: sêlavê diya min bir!

Heta heftîyekê xelk li herdu kevîyên Sablaxê li termên mirîyên xwe digerîyan, yê ku mirîyê xwe didît, dawet li dar dixist, lê diya min!aaax. . . xwedê tenê û ew lehîya zalim dizanin bi kude çû, lehîyê diya min bir, berê jî Erarat bavê min daqurtand, û ez? Gelo kî wê şopa min ji vê xaka sar bibirre!?

82

Riza şah piştî demekê hate Mehabad(navê wê, wê demê Sawcbulaqî Mukrî bû), lê weke Azerî dibêjin: toydan sonra Neqqare?! ango piştî dawetê, nû def û zirne tê!! tiştê me ji hatina wî fêde kir, navê Sawcbulaq bû Mehabad.

Êdî nema sebra min li Mehabadê dihat, dawîyê termê diya

min jî derket li darekê rawestiya bû, Kerîm ez demekê birim Şino, da ku xwe ji bîr bikim, lê min bêrîya goristana ku dîya xwe ya li bakurî baxê Qazî dikir, lê em venegerîyan.

Gelek ji Mehabadîyan bûyerên jiyana xwe bi wê salê nas dikin, tu bawer nakî? Ji qutabîyekê xwe bipirse: tu kengî çêbûyî? Wê bersivê bide: yan berî , yan piştî , yan salî Sêlaw. Çavên te radimûsim. Mujde

\* \* \*

di kaxezên Mujde yên dî de ev name nivîsandîbû:

Badîn giyanim

Ez bêrîya te dikim, ez hogirî te bûme. nikarim têkilîyên germ bi hemkarên xwe yên dibistana Perwane re deynim, keçikên qutabî gelekî ji min hez dikin, ji wêne û nigarên ku ez ji wan re dikêşim, ji rengên têkel yên ku ji du û sê rengan pêk tînin, yên ku ez wan fêr dikim pirr hezdikin, îro min li ser textereşê ala Komarê resim kir, weke perwaneyên li ser gulên biharê xwar bibin, xwarî defterên xwe bûn û bi tilîyên xwe yên nazik her yekê alek resim kir. Lê jiyana min? heta niha wênesazê gewre(xwedê) bi rengên tehl û tarî ew neqîşandibû, lê tu hatî û te kevçîyek hingiv û ronahî rûkire nav Rengdanka min, ne tu bî ez rojekê tenê li Mehabadê rûnanim.

Min di name ya bihurî de, ji te re qala sala lehîyê kir, û min nivîsî ku em çûne Şino yê. Berî şerê mezin dest pê bike em veegerîyan, gelek mihacir ji Dêrsimê li wê derê bi cih bûbûn, di nav wan de yekî dîn hebû, kefa destê wî ya

83

çepê tim Hinnekirî bû, ji Hinneyê pê ve behsa tişteki nedikir, her em didîtin digot: Hinne li Dêrsim nemaye! Mal bi mal Hinne pars dikir, navê wî kiribûn parsekê Hinnê, rojekê nema hate dîtin, gelean digot, wî berê xwe da Dêrsim û li nêzîkî Geverê hate kuştin, lê bazirganekî ji Şino sond dixwar ku : min ew bi çavên xwe li Silêmanî dît.

Dema şerê mezin dest pê kir em ji Şino hatin, Kerîm vê carê malbata xwe jî bi xwe re anî, wî digot: erê Mehabadîyan sala Simiko ji bîr nekirine û ji Şikakan nefret dikin, lê çare nîne, Şino nêzîkî sînore, eger tankeke Rûsî ji Bako bide rê, wê me hemîyan bipelêxe. Wî nizanî bû çî di tûrikê qederê de heye!!

Jina wî û du zarokên wî û pîre dîya wî û ez, me da pey wî, em bi meşê hatin vî bajarî. Li rex çemê Sablax, malek peyda kir, em şeş mehan tê de man, heta rojekê balafirên Rûsî , ew navçe bombaran kirin. Ez ne şaş bim berî çar salan bû, Kerîm ez û diya xwe biribûn çinîna genim, jina wî jî li ber herdu zarokan mabû, em li nav zadan çav li balafirên Rûsî ketin, mîna bazên nêçîrê hêlan dikirin. Û bû gurmîn.....

Dû ji xaniyên bajêr kişîya , weke ku rehek di dilê Kerîm de biqete, ew qîrîya û bê ku li pişt xwe bizîvire, das ji destê xwe avêt û berî da bajêr, jina wî û herdu zarokên wî qetoqeto bûbûn, mejîyê kurê wî yê biçûk -Ismayîl - bi dîwarekî kavi ve rêz bûbû.

Pîredîya wî jî ji kerban mir, çav li kurê xwe yê kezebşewitî diket û digirîya, deng ji Kerîm nedihat, ku diaxivî jî

digot: ne ji xwîna hejaran bûya, Krêmlin sor ne dibû!!

-Rûs hatin.

Weke birûskeke, ev xeber li Mehabad geriya, porsipîyan  
hinerên Rûsan dîtibûn, sala ku Rîbal Tşînko kete  
Mehabad jî ji bîr nekiribûn, ziravqetî nediwêrîn ji mal  
derkevin, serokêl û karmendên dewletê bazdan, Mehabad  
84

bû mîna tûrekî tu dawêşînî, vala bû. Bûyerê xwe dûbare  
dikir, Rûsan dixwest xwe bi xelkê şêrîn bikin, çi şekir û  
çay û tûtina di enbarên dewletê de didîtin, li xelkê belav  
dikirn, bû dawet, yê ne qelûnkêş bû jî, kulmên tûtinê di  
ber hemêza xwe da dibirin mal. Kerîm jî her roj, heta ku  
reşayî dikete bajêr, li ber gora malbata xwe, li goristana  
Budaq Sultan bû. Çira ya ku ji bo bîranîna jin û herdu  
zarokên xwe- Ismayîl û cafer- li ser gorê danî bû vêdixist û  
geş dikir. Ku ez ne şaş bim, wê salê Komeley Jîyanewey  
Kurd (J. K) saz bû.

Êdî xewa min tê, şev xweş Bado.... te maç dikim Mujde.

\*\*\*

85

Çira duyem

12Nîsan 1946 Mehabad

min nivîsî bû ku ez li Mehabadê weke ku di romanekê de  
dijîm, gelek bûyerên seyr û ecêb diqewimin ku tenê di  
çîrokan de derbas bûne.

Duh bi şev ez çûme mala kalkê xwe li Gerekî

Hermenîyan, Agopê meyfiroş distira, rûyê wî sor bûbû  
weke asoyê ku roj nû tê de ava bûye, ji vexwarinê xwe

nedigirt, kalkê min qerfê xwe pê dikirin, li rex wî  
direqisî, çerqînî ji tilîyên xwe dianî û digotê: de hirçê min  
de.... Ermenistan bi qurbana gunnê te be!

Agopê serxweş, xwe diavête erdê, çarpîyan dimeşîya, ji  
nişkê ve weke hirçan radibû ser lingan û dizûrîya.

-Agop di vexwarinê de kerekî xwedê ye, kezeba xwe  
peritandîye.

Kalkê min qedeha min dagirt û got, Agop qêrîya û got:  
gunê min Entranîk! Keşe di dîya te ga yo, ma tu nizanî  
Vodka Rûsya hemî têra min nake?! Ez nevexwim, wê kî  
vexwe tirro! Bavê min, birayê min, dîya min.....her sê  
...weke kundiran serên wan li ser sekoya mala me li  
Xarpêtê gindirîn. Min got weke kundiran ne?! Na ez  
şaşim, weke sê morîkên mezin ji çewalê xwedayekî lal.  
Û xûşka min, aaaaax, deh kes lê werhatin, kirasê wê  
tîştîştî kirin, bavê min nû jê re ji Qarsê kirîbû, ez pênc salî  
86

bûm, min fêm nedikir çima kirasê wê diqetînin û derpî jê  
dikin, ew sêzde salî bû û deh lê werhatin.

Û bû orîna Agop, wirde wirde deng jê hate birrîn û kete  
xewê.

-eve halê wî her şev, ne tenê weha, ji mêranî jî ketîye.

-ew bûyer raste!

-Badîn, çi were gotin, bawer bike, min bûyerin ji vê  
seyrtir û kambax tir jî dîtine, ez şahidê hovîtîya  
mirovanim, ez nizanim çima ew qasî xwîn erzane!!

Misilman, Cihû, Xiristîyan, Kurd, Rûs, Ereb, Ecem,  
Azerî, Ermen, Tirk, gû, rêx, navên grûpên dirrindeyanin,

xwedê bi xwe jî nizane çima ev xelk ji siya hev tehmûl nakin!

Kurê min, bi qasî ez dizanim kurd li Ermenîyan neheq bûn, ez dizanim Ermen jî wisa bûn, eger fersend têketa wan, wê xwîna Kurdan vexwarina, min bi xwe li Rewandizê perîşanên Kurdan diavêtin çem, erê min. Kî n mirovan kor dike, Rûsan jî kî n di dilê me de kedî dikirin, da ku şerê Osmanîyan bi me bikin, Almanan jî şerê Rûsan bi Osmanîyan dikirin, Osmanîyan jî Kurd di axurên xwe de perwerde û dermale kiribûn, ji rojêke wisa re .... welhasil çîroka rêxê ye, her ku tu tev bidî wê bîn pê bikeve.

Çend qurt ji Vodka berdane gewrîya xwe û cihê xwe xweş kir û got:

Bado ez dizanim tu çawan difikirî!!xwîna te germe, ne ji ber xortanîyê, lê ji nezanîyê, gelek hêvî li bal te hene, te xebata siyasî miyasî jî kirîye, tu ketî nava partîyan jî, lê hîç e, dem partîya mezin e kurê min, bibe endamê Partîya Demê, bê ku tu kiras mirasan bi demê ve bizeliqînî, tu fê m dikî ne, berxê min.!!

Partî qaşilekî teng e ji mirovan re, yê partîzan nafikire, çima? Ji ber ku bi rêberekî bawer e, partîzan foto yeke, her di halê xwe de dimîne, foto xemgîn be, wê bimîne  
87

xemgîn, şad be, wê bimîne şad, ol û dîn jî ew rêxe, Anûş.

qedeha xwe li ya min xist û berdewam kir: ev mey hebe, û ew bêxwedîkê di nav lingên jinê de, yê nerm û lûs û



germ û rûs jî peyda bibe, haya min ji bayê felekê namîne.  
Erê jin, lê ne jina diya zarokên mirov, ango jina bi  
zewacê ketibe ber hemêza te, na, zewac ji xwe partîya  
herî tengê di nava partîyan de. Bûye sî sal ez bê zewac  
dijîm, lê min jin bi qasî derdê dilê te dîtine, Kurd, Ereb,  
Tirk, Faris, Cihû, Rûs û Ermen û her milletê ku nayêne  
bala te, bi dehan di bin sîya gunnê kalkê te re derbas  
bûne, min hez nekir û xwe nekire êsîrê ciwanîya keçekê,  
hezkirin jî partîyeke, ma ew çî jine ku çavên te ji yê  
mayî bigire?! Jineke Ereb ji Bexdayê hebû, her ku ez lê  
siwar dibûm digot: ya şêx Ebdulqadir, ya seyyidî Husên.  
Ya nizam kî, welî û pêximber nediman, bang li hemûyan  
dikir, min tenê bang li efendîyê xwe dikir û wî jî weke  
min dixwest dikir, de êdî dev ji min û qiseyên qorr berde.  
Min dizanîbû ku kalkê min êdî serxweş dibe, lê peyvên wî  
bi serxweşîyê re hîn kûrtir û germtir û watedartir dibûn, çî  
raze di meyê de ku kelemekê tenê jî li ber ziman nahêle!!  
Çavê kalkê min li dîwana Wefayî ket, di bin qedeha min  
de bû, hema qedeha min xiste destê min û dîwan da  
alîyekî û got:

Dehşikê min ev jî hîçin, eger debara te bê xwendin nabe  
tenê çarîneyên Xeyyam bixwîne, min barê deh qantiran  
kitêb xwendine, çî dibêjin! nezanîya te kûrtir dikin, te  
dûrî jiyânê dikin. jiyana ku tu dijî, bûyerên ku li serê te  
diqewimin, ewin kitêbên rasteqîn, here salekê li xurbetê  
bijî, beranberî sed kitêbên li ser xurbetê ne. Mehekê di  
nava agirê cengê de be, himber sed romanên cengî ne.  
Min romaneke Rûsî li ser şerê Sari Qamîş ê xwened, yê

ku nivîsî bû, bi xwe di şer de bû, ez jî li hêla din di şer de  
bûm, lê ew roman!! Bawer bike mîna yekî lal ji tere

88

felsefeya Aristo beyan bike. Kî dikare wê deqeya di  
navbera jiyana û mirinê de pesin bike? Kî dikare wê tirsê ji  
bombeya ku li rex te teqîya ye têxe çarçovekê? Kî dikare  
hestên yekî ku serê hevaleyê xwe yê ku berê kêlîkekê pêre  
di axivî û cixare dikêşan li hewa dibîne, derbibirre? ew  
kesê ku di şikeftên dûmankirî û devgirtî de, bi zarokên  
xwe yê şîrmij û yeksalî ve dimirin, xwedê jî dikare wê  
kêlîka gawir bîne ziman.?!!

Kurê min nekeve gumana ku ez dixwazim te bêhêvî bikim,  
yan te ji rê derxim, te rêya xwe naskirîye û tu li ber derîyê  
zewacê yî, lê omîda min ewe ku asoyên ramanên te firetir  
bibin, tu ji siya xwe dûrtir jî bibîn.

Kalkê min çavên xwe bi ser hev de qurç dikirin, mîna  
yekî ku têkeve cengeke giran bi xilmaşîyê re, min dît  
cixareya wî di destê wî de bûye arî û vemirîye, haya wî jê  
nebû, qutîya bavê min, ya ku tûtina wê kêm nabe,  
kişande ber xwe û cixareyek pêça, di nav şilkirina wê re  
got:

-eve halê me û dewletên mezin.

-min fêma ne kir kalo!

-tu jî kerekî mîna bavê xwe yî, lo! Wî jî ji min fêma ne  
dikir, xwedê kirî ez bi kurmancî dibêjim.

Vodka serê wî zêft kiribû, mejîyê wî, êdî mîna hevîrekî  
ron bûbû, raman weke mija sibehan diherikîn, min jî da  
ku xwe wînda nekim gulpin piçûk li piyala xwe dixistin û

li kalkê xwe yê serxweş guhdarî dikir.

-Dewletên mezin me timadar dikin, weke çawa masîvan,  
hinek hevîrê jehrkirî, yan kurmikekî bi serê çengelan ve  
dikin û berdidin avê, masîyê ehmeq dibeze çengelê û  
hooop!! Çengel devê wî zeft dike.

-min dîsa fêm nekir.

-ne min got tu kerî û kurê keranî jî, oxlim divê ez bi elif û  
bê ji te re bibêjim heta te li ber xim, yavrum ev komar  
kurmikeke di devê Kurdan de ye, Rûs li neftê digerin,  
89

bûye sî salê wan ku xwe nêzîkî ava giravê dikin, ne dûre  
sibe peymanan bi Heme Riza re deynin û hûn li ber ava  
gunnê Heval Stalîn biçin. Tu xeberên radyoya Tehranê  
his nakî, yan guhê te şimikirî ne? Ne duh pêr bû  
Qonsulosê Rûsyayê li Tehran bi pehlewîyan re rûnişt û  
xalên vekişandina Artêşa Sor ji erda Îranê danîn.

-Artêşa Sor!!

-erê artêşa gû. . . .

-ma wê çi bibe, bila vekişin, ewqas pêşmergeyên me  
hene!!

-Wê çi bibe!! tişteke nabe berxê min, wê bikutin dayikên  
we û biçin. Ê kenekî dînokî kir û piyala nizanim çendan  
rakir û got: Anûş pêşmerge yê min.

Ez geh kenîyam û geh bi ser xwe de ponijîm, û di peyvên  
wî de fikirîm, xirexira Agop ode dihejand, kalkê min ber  
bi wî ve çû, lingê xwe li zikê wî xist û deng jê birrî û got:  
ev hirç lawê hirçan jî, her ku vedixwe dibe meşkek, xuş û  
xuş û xuş....heta sibehê.

Hema li ber derî, kalkê min bişkokên pantelonê xwe vekirin, û mîz kir, di nav mîzkirinê re li pişt xwe dizîvirî û digot: bavê te jî ew ker bû, ez mîz bikim ezê behsa wî ji te re bikim, rehma xwedê lê bibare vê şeva meelûm. Serê min gelekî pêre êşîya, kalkê min xwe da ser palgehekê û rûyê xwe xiste erdê, ew nû hatibû enîya şer, digot - her hal wî nizanîbû ez Ermenî me- : ez hatim cihada gêwir. Cihada quzê dîya wî bû, dev ji Amêdîyê berda bû û li Sari Qamîşê li morîkên gerdenîya dîya xwe digerîya! Cihad kurro!!lawê keran, heta min ew fêmkirina da ku Osmanî ji Rûsan gawirtirin mû bi zimanê min ve şîn hat, erê tu bawer nakî? Binêre û kalkê min zimanê xwe dirêj kir.

weke mûyên ku li ser şanik û xalekê şîn dibin, di koka zimanê wî de jî gurzek mûyê reş şîn hatibû, yan li ber çavê min wisa xuyabû, min bi tirs lê nihêrî, û ji çavên xwe 90

bawer nekirin, wî got. Erê Bado, ev mûyê rastîyên e, kî rastîyê bibêje, mû li ser zimanê wî şîn tîn, lê kesê ziman bi mû di dîrokê de li ser tilîyên destekî tîne hijmartin. Min zimanê xwe, di devê xwe de li diranên xwe xistin, pêjna mûyan nebû, naxwe min hîn rastî negotîye û nizanim rastî jî çîye, ez di wan ramanan de, kalkê min berdewam kir:

Ne ez bûma bawer bike, wî ji şer baz nedida, cennet û heftê Horîyên çavbelek û goştzelal û çardasalî li hêvîya wî bûn, wey xwelî li serê we be, xelkê dikutta xwehên we û hûn bi kuttana horîyan timadar dikirin. Wey xwelî li serê

we be.

Êdî şev dereng bûbû, axaftina kalkê min jî giranbûbû, lê weke ku hîn hişê xwe winda nekiribe, ji nişkê ve rûnişt û got: kurê min dilê xwe ji min negire, ez ne serxweşim û tucarî jî weke vî hirçê han ji piyan nakevim.

Vodka ya di binê piyalê de mabû, berda gewrîya xwe û got:

tişteki Rûsa baş nîne ji bilî Vodka yê, eger ew Almanî bûya ezê Nazî bûma!

-bi vê pîvanê be tu komonîstî!?

-komonîst?! Bado bi şevbuhêrka me de nemîze û qala van jehran neke.

Min xwest ez hinekî wî niquşk bikim û bêtir li kûranîya dilê wî binêrim, min gotê: de ka tu çîyî, eger ne komonîstî!!?

-ez çi me? Ez bilûra li ber guhê gayê cotim! Kurê qantirê ev bûye seetek ji te re dibêjim, ez mirovekî ji zincîr û qeydên mirovan riha bûme, min xwe ji ol û ji neteweya xwe bi heft avan şûştîye, ez ne hemwelatî yê tu dewletê me, ezim û Vodka ye û Studyo ya mine. amîn. studyo ya min Ermenistana min e, Vodka jî hevalê min e, partîya min e serokê min e, xwedayê min e. û şûşeya vala di bin guhê dîwêr de lêxist.

91

\* \* \*

Vê sibê ez dereng ji xew rabûm, kalkê min û Agop çûbûne karên xwe, min kirtikek penêr û hinek tirşî bi nîv nanekî xwar û berê xwe da çayxaneyê.

\* \* \*

13Nîsanê 1946

êvare . di êvaran de jî, hestên şairan weke Şaberrûyên li ser agir diteqin, har dibin û dilê jar didin ber gezan. Lê ev rojbuhêrên ku ez wan dinivîsim, rê li ber helbestê girtin e, ez dixwazim jiyana xwe li ser rûpelên tazî weke giyanê min raxînim, çiku mirin her di guhê min de li zengilê xwe dide, bang li min dike.

Hinek serma ji zivistana çûyî di odeya min de maye, hestîyên min jî serma di xwe de veşartine, lê ez bi bîranînan xwe germ dikim, bi Silêmanîyê..Amêdîyê û wan bajarokên ku rojên min di devên xwe de weke benîşteki dicûtin û pûç dikirin. Ez bêgav dest dihavêjim xameya lal, pênuşa ku ji bilî jan û hesretê pê nehatîye nivîsîn.

Vê sibê weke duh, dîsa ez dereng ji xew rabûm, kalkê min çûbû studyo, û taştê li dû xwe li erdê şemirandibû. Min çend kirtik penêr û mastê kîs yê zeytkirî û du sê lib zeytûn xwarin û çend qurtên lezok li qedeha çayê xistin û çûme dibistanê.

Mudîrê wê, Reşîd Ezîzî bi ser min de rabû û derengçûyîna min weke behaneyek xurt dît û got: Hûn her çî Barzanî ne Kurmancê reşin, karê we tiving û şer û çîya ye, çî we û dibistanan?! Ha?. û bi Farisîyeke qebe jî gotina xwe bi dawî kir: INCA DEBISTAN EST AXA!! MEYXANE NÎST.

Min lê vegerand û got: şerefeke mezin e bo min ku ez di refên Pêşmergeyan de bûm, lê tiştê ku haya te jê tunne,

ez bi kêrî mamostetîyê dibim, bêtir ji çekdarîyê, lê tu?

92

Gelo tu diwêrî bi şev deh gavan dûrî derîyê mala xwe biçî

.!!

Û ez derbasî klasa xwe bûm, ne bese wî Mujde dûrî min xist, dixwaze ku ez jî ji dibistanê derkevim, lê bavê wî jî were ezê bimînim, Menafê Kerîmî ji min razî ye, û haya Mele Mistefa jî ji min heye ku ez çî dikim, wî tim gazin ji min dikirin û digot: Badîn çima tu şer dikî, karê te ilm û kitêbin, here bila şerê te li gel nezanîyê bi kaxez û defter be.

Piştî min dersên xwe qedandin, ez çûme çayxaneyê, Kerîmê Şikak li wir bû, rûyê wî tirs û çihreyê wî lihevketî, û bêdeng li bakur dinihêrî. Min silaveke nebihîstî lê kir û li rex wî rûniştim û ez jî noqî gola bêdengîya wî bûm.

Piştî kêlîkekê, min çuqlîyên axaftinê hejandin û pirsî:

Kerîm çî bi te hatîye?! Ma hîn tu ji min xeyidiyî?

Bêyî ku awirên xwe ji bakur dagerîne got: ez ji te naxeyidim, û te û Mujde jî pîroz dikim, lê serê min van rojan ne vala ye.

-Çi heye?

-ma te ne bihîst!?

-çî ? çî qewimîye!!

-artêşa sor vedikişe!

-kê go?

-radyoya BBC. Berî tu derbas bibî, di weşana xwe ya

Farisî de got.

-tu xemgînî!?

-na, lê ez ditirsim Badîn, Komar li ser hilm û pifekê maye, wê Rûs me bifiroşin. Kerîm hevoka dawî bi dengê bi zor hate bihîstin got, min xwest ez ber dilê wî bidim û jê re got: ne mumkine heval Stalîn vê yekê bike, bawer neke wê nûçeya radyoya derewkeran. Kerîm hêrs bû û bi awireke tûj li min nihêrî û got: Stalîn jina min û 93

zarokên min kuştin, wê vê komarê jî di pêçekê de bikuje tê bibînî.

-ma lîstika zarokan e, soz û peyman û..

-û gûyê kerê.....ji xwe peyman kurdan dixapînin, bawerîya wan bi sond û peymanan bûye bela serê wan, bawer bike Badîn, ez ne ji reşbînîyekê dibêjim, lê ez rewşa vê herêmê ji mêj de dipêçim, ez dizanim li pişt perdeyan kî bi kê re ava serê me germ dikan!!

-tiştan mezin neke, ne wehaye.

-ez bi dilê xwe li bûyeran mêze dikim, ne bi çavên xwe, ev komar weke şekirê tu bixî devê zarokan da ku negirîn, Armanca Rûsan nefta bakur e, Kurd ne di hesabê wan de ne heyran, lê ji ber ku Komele hebû, û roj bi roj qelew dibû û peyrewên wê bûn bi hezaran, Rûsan dest danî ser, ji tirsê ku Ingilîz wê bi alî xwe ve bikêşe.

tu kes ji bo xwedê nabe dostê Kurdan, em zû dixapin zû.

-nûçeyên BBC bi xerez têne gotin.

-ji xwe nûçeyên weha nivê rastîyê dibêjin, nivê mayî jî li ser te û hişê te yê vekirî an girtî dimîne.



Min dît ku Kerîm ji ya xwe danakeve û hêrs bûye, min nedixwest ku dîsa ji min bixeyide, min rabû berê şorê bi alîkî dî de bir û bi fedî jê pirsî: tu mesela min û Mujde çawa dibînî!?

-Min berî niha hûn pîroz kirin.

-Yanî zewac kengî be baş e?

-Mujde!! Badîn zewac ne hêsane, û tu dizanî bê em di çi rewşê de dijîn. Hinekî sebrê bike heta rewş zelal bibe.

-ez jî dizanim zewac ne hêsane, lê dil westîyaye Kerîm, êdî taqet û hêz têde nemaye, min hesabê xwe kirîye û Mele Mistefa yê Barzanî nêzîka çarsed Riyal dane min da ku ez li zewaca xwe xerc bikim, maleke min jî heye ez tê de disitirim, hîn çi!?

94

-niha nelezîne, eger tu bixwazî nîşan bike û pişt re emê binêrin, niha dilê min û ez vegerim Şino heye.

Min fikir ku bipirsim: û Mehabad, lê xirtepirta Emîral Axa û derbasbûna wî ya çayxaneyê bala her kesî kişand. Di serî de weke her gavê berê xwe da qedehên avê û rûkirin satila xwe û berê xwe da kesên rûniştî û got: xemgîn nebin, min jî bihîst, bila Artêşa sor biçe, ez bo we Artêşeke şîn amade dikim, hêza wê deh qat li ya sor e, emê Mehabad bikin giravek, ma tankên Hemeriza dikarin di ser avê re bimeşin!! ma nebî Îsa ne?!eger teyare jî werin Mehabad, wê pîlot gêj bibin, ji xumxuma pêlan nema ber xwe dibînin û wê di avê wer bibin...xemgîn nebin..û satila avê li erda çayxaneyê rijand û destê xwe avête nav lingê xwe û agot: ev Artêşa Sor e.

bû zîqzîqa kursîyan di bin kesên rûniştî de, kirîzeke ken li çayxaneyê belabû, mase çûn û hatin, çay û qehwe li nav hev ketin, her kesî bi newqa xwe girtibû û bi çavin girtî li banê çayxaneyê dinêrî û dikenîya. Emîral axa tenê nekenîya û derpîyê xwe kişande xwe û satila xwe li dû xwe hişt û derket.

Ez û Kerîm bi ken ji çayxaneyê derketin, çi binêrin!! Tu li kê rast têyî dikenne, kenekî ne asayî bû, heta kerên gundîyên ku hatibûn sûkê jî dikenîyan û diranên wan qîç dikirin. Dikançî, minalên cil qerpolî yên li serê zikakan dilîstin, pêşmerge, siwarên hespan, jinên di bin çadirên reş de, dar û ber jî dikenîyan. Me dilezand lê ken bizava me giran dikir, heta em nêzîkî Studyo bûn, çi binêrim!! xwedêyo ev çîye! Fotoyên di camekeyê de hemî dev li ken bûbûn, tenê yê Pêşewa ku di nivê camekeyê de bû, bi wê riya sivik û rûyê zirav xembar bû. Tirsekê da ser min û min bi quncê çavan li Kerîm nihêrî, wî jî ziq li foto yê Pêşewa dinêrî, dengê kenê kalkê min û Agop ji hindir dihat, min di wê navê re çû serek li dikana werîsan xist, weke her carê werîsfiroş werîsekî ne zirav û ne jî qalind

95  
di nava tilîyên wî de weke tizbîyekê pê dilîst. Rûyê wî tirş girêkek di werîs de çê dikir, bê yî ku çavê xwe ji werîs rake, pirsî: te dîsa çi divê!?

-dermanekî ji bo rawestandina ken!

Min di dilê xwe de got, wê niha bi min de bixeyyide, lê wî bi ciddîyet li min vegerand û got: ev werîs, ev werîs wê kenê Mehabadîyan rawestîne. Ez bêtir kenîyam.

\* \* \*

ber roj ava ez û Kerîm li çapxaneyê Kurdistan bûn,  
teqeteqa makîneya çapê bû, te digot dêweke û dikenne,  
makîneya şêx Mehmûd hate bîra min, ew makîneya ku di  
şikeftan de zeng digirt û inglîz ji şêx bêtir li pey  
digerîyan. şêx jî nameyên xwe yên ku ne digihiştin tu  
adresen, pê dinivîsandin. Her sê nameyên ku ji Lenîn û  
hikûmeta Sovyetî re şandin bi wê makîneyê çap kirin,  
dema ez çûme ziyareta şêx Mehmûd wî kopîyên her sê  
nameyan şanî min kirin, di ya yekem de gelek qurretî  
hebû, tê de dihate xuyakirin ku çiqasî Kurdên wê serdemê  
ji xwe bawer bûn û ji hikûmeta sovyetî re nivîsî bûn ku:  
em destê biratî û dostanîyê dirêjî we dikin, û ji bo  
xurtbûna me hinek Top û teyare û tiving ji me re divên û  
em kurd amade ne alîkarîya we bi can û dil û mal  
bikin!!!!!! Lê di ya duyem de hinekî bixwebawerî sist  
bûbû têde nivîsî bûn: em bi hêvî ne ku lijneyeke bêteref  
were Kurdistanê û kiryarên hovane yên Ingilîzane bi çavên  
serê xwe bibînin! Di ya sêyem û dawî de, tenê edalet û  
insaf hatibû xwestin!! Lê Sovyetan ne tank û top û teyare  
şandin, ne jî lijneyek şandin, û ne jî insaf kirin. şêx  
Mehmûd bi keser digote min: em çî bikin!! Xwîna Kurdan  
bi bazara her dewletê erzan e.

Em derbasî odeyeke tarî bûn, Hejar û Hêmin, her yekî  
pelikek di destê wî de, nivîsa xwe ji tîprêzekî re  
dixwendin, dema çav li me ketin, kursîyên xwe yên  
xêzeran kişandine ber me, Hejar bi germî ez hemêz kirim

96

û got: ez ji Barzanîyan hez dikim, ne tenê şervanin, şîirvanin jî, komar bêyî wan komir e. û yên li wir hemî kenîyan.

Hejar ji bo rojbûna xwe hinek şekir û kulîçe anîbûn, rojbûna Hêmin bû jî, wî jî tûrikekî piçûk, ji qenda Kirmanşahê anîbû, me ji wan re pîroz kir û bi kêf ew şêranî xwarin.

Sedîq Encîrî, berpîrsê kovara Hawarî Niştiman jî li wir bû, hejmara nû ji çapê re amade kiribû. makîneya çapê ya ji nifşê ROTARÎ ya Almanî, na Rûsî ye lê hin parçe tê de Almanî ne, em bi dengê xwe yê weke kenê dêwên efsaneyan gêj kirin, dengê me baş nedihate hev (bê weha jî dengê Kurdan nayê hev) em bêgav bûn herin odeya Hisênê Mîkaîlî, berpîrsê çapxaneyê.

Wî xêrhatinî bi me kir û got: çapxaneya me, berî çar mehan ji Tewrêzê hat, lê me karê deh salan pê kir, eger zimanê wê hebûya wê gilî û gazine me ji xwedê bikirana, ma ne tiştekî seyr e ku ew mirovan fêrî axaftin û suhbeta xweş dike bi xwe jî lal e!!

Hêmin keserek dirêj hilanî û got: eger ev makîne, berî sed salî hatibûya Kurdistan, bê guman yek ji kitêbên me winda ne dibû.

Kerîmê heta niha bêdeng mabû, got: erê.... hema dema ku Rûs hatin Sablaxê, berî sê salî, dîwana Misbahuldîwan (EDEB) winda bû û şop jê re nema, kes nizane bi ku de çûn ew helbestên tenik û nazik?! Heta camêrekî li bexdayê....

-Beşîr Mişîrê terzî??

Hisênê Mîkaîlî gotina kerîm birrî. Kerîm jî berdewam kir û got: erê. Wî camêrî ji devê sedan kes û ji kaxezên di nava feqe û mele û edebdostan de belavbûyî, dîwana EDEB bi hev xist û çap kir, lê bi dehan dîwan çûn û şopa wan nema.

97

Hejar got: rast e, weke meteloka Mukrîyan dibêje: ewey mêrûle wexrê deka be salêkî, wiştir deyxwa be qepalêkî. Keda dehê salan bi agirekî dibû xwelî, bi talanekê re diçû, di lehîyekê de winda dibû, lê niha?.... Hisênê Mîkaîlî got: niha bi saya hevalên me yên Rûs edeb û wêjeya me tê parastin û....

Kerîm xwe ne girt û bi tûjî got: mamoste... qencî ne ya wan e, ev makîne bi pere tê kurrîn û li her bajarî peyda dibe, lê bi saya xwîna germ ya azadîxwaz ya ku di rehên me de dikelîya , ev makîne hate Mehabad.

Rûyê Hisên hinekî zer bû, Hêmin û Hejar jî ne rihet bûn ji wê gotina Kerîm, min rabû got: niha dev ji makîne yê berdin, ka em hijmara nû ya Kurdistan bibînin.

\* \* \*

niha ez li odeya xwe me, kitêbên min weke serbazên yekîneyeke leşkerî li dû hev rêz bûne û bêdeng in, lê her yek hawareke nuhênî di wan de ye, dîwana Wefayî ya ku bi xetên Qadirê Muderrisî, dîwana herîq, ya Edeb ku Beşîr Mişîrê terzî sala 1939 an li bexdayê çap kiribû, hejmareke kovara Niştîman (tiştê ecêb ewe ku sembola Komeley Jiyanewey kurd bi tîpên Latînî ne J.K. ew di nîva rojekê de hatine resim kirin û bi ayeteke Quranê xemilandî

ye). Ma ne ecêb e ku dîwanên Cezerî, Feqeyê Teyran,  
Mem û Zîn a Xanî, li vî bajarî peyda nabin?! Li Silêmanî  
û Hewlêr û Kerkûkê jî weha bû, û li Amêdyê çavê min li  
berhemên Hacî Qadir û Herîq û Salim û Nalî ne  
diketin?!herêmên Kurdan weke giravin ji hev qut di  
deryayekî de ne, pêwiste kelek û gemî û qeyik hebin  
xelkên giravekê bighîne giraveke dî.

Bayê vê şeva dereng, hilma biharê, bîna kulîlkan xewa  
min tînin, lê dengê wê keça xemgîn tê min:

98

Çendan ki guftem xem ba tebîban

Derman nekerdend miskîn xerîban

Hate bîra min, dema em li çapxaneyê bûn, min pirsas vê

keçikê ji Hejar kir, wî gote min: ev keçik xûşka Heme

Resûlê Mîkaîlî ye, ew xortekî ji xwe razî bû, mamostayê

zimanê Farisî li dibistana Seadet bû, ew dilketîyê Wêlma

bû, bûbû sîya wê, bi ku de diçû, Heme Resûl li pey wê

bû. Wêlma jî keçeke xiristyan û ya herî ciwan bû li

Mehabad, ew yeke serqot, bi cil û bergên teng û Firencî

bû, keça duxtor Wênetanê Hatemî bû.

-Wênetan!?

-erê, Wênetan, yê ku mala wî li nêzîkî meydana çarçira ye

di kolana şîr û Xorşîd de, pişt mala me ye! ew şagirtê

duxtor Cozêf Koçran bû yê sala şêx Ubêdullahê Nehrî li

Ormîye dijî.

Wêlma mamosteya keçikan li dibistana Permas bû(niha

nevê wê kirine Perwîn û Mujde dersan lê dide- B.

Amêdî) kes li Mehabad nemabû ku dilê xwe nedibijande

wê, Heme Resûlê me li ser wê dîn û şeyda bûbû, bi çolê ket, û bû sewdanîyê wê, naçare ew birin Tewrêzê, û çend caran jî ew birin nexweşxaneyaya Tehranê, lê kî dikare derdê evînê derman bike!! Weke derwêşekî Werd û zikrên Hemeresûl, Wêlma bû.

Rojekê ew ji bo dermanekî xwe li dermanxaneyeyeke Mehabadê bû, ji nişkê ve Wêlma derbas bû, dema çavên wî lê ketin yekcarî ji hiş çû û ji qama xwe ket, xelk lê civîyan û xwe dane bin çengên wî, lê êdî taqet tê de nemabû, xwîna sor xwe di kepûya wî re avêt, kalemêrek li wir bû hayê wî ji çîrokê hebû, hindik mabû Wêlma bikuje û bi zirzî jê re got: biceheme, derkeve der, te ev lawik kuşt.

Hemeresûl negihandin Tehranê, bi rê de mir.

-û Wêlma!?

-ew niha li Tewrêzê dijî, haya wê ji bayê felekê nîne.

99

Min hêsrên xwe damalan û di ber xwe de got:

Riswayê işqê تنها ne ez bûm

Kes dî zemanan hubb bê melamet.

Êdî ez li ber kevîyên xewê me, dengê keleşêran tê, pîrka

min digot: Bado di bin erşa xwedê de keleşêrek heye

dibêjinê Dengai, ku ew baskên xwe li hev dixê û ban

dike, keleşêrên erdê hemî ban dikin.

Pêçiyên min ji nivîsandinê tevizîne, pelên min yê spî

neman, ezê sibehê biçim qirtasîyê, na ez naçim ezê

şagirtekî xwe bîşînim.

pelên spî zevîyekî beyarin, ez hestên xwe mîna tovê

genim li ser direşînim û bi hêsrên xwe av didim, bîranîn şîn tîn, birîn şîn tîn, dema ez li kûranîya wan dinêrim, siwarekî birîndar û bê rim û bê mertal dibînim, xwe dibînim.

dibêjin wê Hacî Mistefayê Dawudî (wezîrê bazirganîyê) tûtina Mehabadê bifiroşe Rûsan, gelo ez jî tûtina qutîya bavê xwe nefiroşim!!

kalkê min dibêje: heta Rûs mista dawî ji tûtinê nebin, ji vir naçin.

xwezî tûtin xelas nebe.

Emîral axa dibêje: Rûsan ev komar çêkirin ji bo tûtina wê, welleh welleh...Stalîn bi xwe doza tûtinê dike û dibêje: ma Çerçil ji min çêtir e?! Tûtina koysenceqê bi baran kişandîye Londonê!! Îcar ez hinek tûtin ji qelûna xwe re ji Mehabadê bibim, gelek e!?

\* \* \*

Silêmanî dawîya 1943 an

-ezê tev li şervanên Mele Mistefa bibim.

-na Badîn, ecele neke, biryara Hîwa bibhîze, pişt re tu çi dixwazî bike.

100

Nûrî emîn li min veğerand, lê min bersiva wî bi tundî da:

-ez ji ser ya xwe danakevim û Hîwa mîwa nas nakim, agirek vêketîye, divê ez çend êzingan bihavêjim ser. Êdî nema karim di çirava nakokîyên Hîwa xanim de avjenîyê bikim, hin çepgirin, hin jî rastgir, hin terefdarên Ingilîzin, hin yên Sovyêt in, hin yên nizamim kê ne? Malavayo tu bi xwe jî dizanî bê çiqasî ziravê Refîq Hilmî ji Ingilîzan



dîqete, hema dibêje : ew xurtin, lê Rûs ji me dûrin. ma ne wî ne hişt ko xwendekar herin Mosko!!? Ma ne ew dibêje ku divê şer nebe, ji bo Birîtanya nexeyide!! Em li razî kirina Birîtanya digerin yan li azadîya xwe!! ez ji vî bajarî bêzar bûme, nema deyaxa min heye Nûrî.

Lê wî bi dilê min yê kul zanîbû, gote min: çima tu nabêjî Jale çû, ez nema debar dikim!! kîna ingilîzan ne ji valatîyê ye Badîn. tu di evîna xwe de bi ser neketî, îcar tê berê xwe bidî agir, ma şer hêsan e kaka? Eger her evîndarekî têkçûyî tev li Barzanî bibe, wê Kurdistan ji xortan vala bibe.

-Nûrî tika dikim birînên min nexurîne, birîn bi zor hatîye hev û alig pê ketîye, nehêle careke dî biaxuve. Biryara min ji ber hestên min e, ne ji ber evîna têkçûyî ye, ezê biçim xwedê jî dakeve erdê.!

Bû sibe min berê xwe da Helebçe û bûme mêvanê hemşarê xwe û dostê xwe yê zarotî û xwendinê Sadiq Behadînê Amêdî, yê ku bûbû mamostayê Cografîya yê. di şeveke berfînî de min agirê di dilê xwe de raberî wî kir, lê wî jî weke Nûrî şîreta neçûnê li min kir û got: Badîn..xebera Nûrî ye, neçe û dûrî karê çandî nekeve, heyfe yekî mîna te bi gulleyeke kor bimire, binêre ez ne kêmtî te me di neyartîya ingilîzan de, lê ez mamostetîya xwe naşemirînim, minalên kurdan fêrî jiyaneke azad û ronî dikim, ne tenê ji wan re sînorên Kurdistanê beyan dikim, lê zulma Cografîya û sitema sînoran jî bi wan didim

101

naskirin, eger tu bixwazî, ezê ji bo te karekî li dibistanê

bibînim.

şîretên dostan û evîna jale ya ku pêtên wê di dil de hîn  
nebûbûn arî, zincîr li lingên min gerandin, ez hîn ji çûn û  
hatina di zikakên Silêmaniye de têr nebûbûm.

Di civînên Hîwa de gelekî qala Barzanî dibû, hinan digot:  
Almanan ew hêvotîye û çek jê re bi balafiran têne xwarê!!  
hin jî di wê bawerîye de bûn ku Tirkîye alîgirê wî ye û  
doza Mûsilê ji bîr nekirine, lê gelek digot: ew rast  
dixebite, bi gilî û gazinan Ingilîz mafên me nadin, divê  
em serê dar şanî wan bikin.

Nûçeyên ji enîyên şer dihatin dilên me xortan hênik  
dikirin, Barzanî roj bi roj bi ser diket, ref bi ref şervan tev  
li wî dibûn, bi dehan qereqol piştî qereqola Şander ketin  
destê wî û bi sedan tiving û topên çiyayî... êdî em li hêvîya  
çi ne?! Hîwa diherifî, weke dîkan me di civînan de kumik  
li hev sor dikirin, yek caran me dest jî dirêjî hev dikirin.  
Sîya Almanya roj bi roj ji ser Ewropa dadigerîya, em rojê  
sê caran li çayxaneyan kom dibûn û me li nûçeyên BBC  
guhdarî dikir:

-berxwedana şarê Lenîngradê xurttir dibe.

-Stalîngrad rizgar bû, û marşalê Almanî Von Bolos di gel

-sed hezar serbazî xwe teslîm kirin.

-bajarê Essen bû kavil.

-tiştêk li kölnê, li ser hev nema. Dom a wê ya navdar bû  
kavilekî wêran.

-pênc balafirên Lankister yên ingilîzî, çend bingehên  
leşkerî di kûranîya erdê Almanya de wêran kirin.

Ingilîzan ne dixwestin, cengek e herêma li dar bikeve,

aramîya London di ser azadîya milletan re didîtin, çare  
nema, xwestekên Barzanî bi cih anîn û di rê ya hin  
efserên kurd re, ku di hikûmeta Nûrî El Seîd de bûn,  
aştiyek weke diranê leq li dar xistin.

102

Hêdî hêdî cillik ji bin lingê Hîwa dihate kişandin, nema  
bawerîya xelkê bi qerwelkên Hîwa dihat, ew li dora agirê  
germ yê ku Barzanî geş kiribû civîyan, wê gotinên xav û  
pûç li himber gurmîna top û tivingan çî bikirana.!!?  
Hîwa weke bûka berfê li ber tava şoreşa Barzanî dihelîya,  
komek tev li komonîstên Iraqê bûn û belavoka AZADÎ  
derxistin, hinan jî partîya Rêya Rast ava kirin û ez jî bûme  
êzingek di şoreşa şekir de.

Erê şoreşa şekir, ma şekir hindik e? Barzanî ev nav li wê  
serhildan wê salê kir, ji ber ku şekir weke niha pîrr kêr  
peyda dibû, Ulu beg serî li qereqolek e leşkerî li Mêrgesor  
da û doza Erzaqan û şekir kir, lê li şûna şekir, serbazên  
Iraqî sê gulle di dilê wî de çandin. Û serhildanê dest pê  
kir.

Hîn ez li Silêmanî bûm, berî serhildanê, Rojekê Nûrî li  
taxa Serçimîn, pêrgî min hat û bi ken got: Badîn binêre!!  
Niha Ingilîz û Barzanî bi piyalekê vedixun.

Min jî bi ken lê vegerand û got: ew piyal wê zû vala bibe  
û tê bibînî, Ingilîz jî gurên berfê ne, kes li wan êmin nabe  
û Barzanî lawê çîyan e. ez jî dê kela dilê xwe di bin sîya  
ala wî de sar bikim.

-û evîn!?

-bû xewnek, birînek bû, tenê alig û dewsa wê maye.!!

\* \* \*

Mehabad 20 Nîsanê 1946

Kê gotîye evîn dibe xewn?! Min gotibû?! Sê salin Jale ji ber çavên min çûye, lê ji vî dilê min yê kizirî bipirsîn, eger hûn karibin pencereyekê tê de vekin û li kûranîya wî binêrin, hûnê Jale weke pêtîyek e geş di xwelîya wî de bibînin. Sadiq Behadîn digot: her tişt ku kevin dibe, bê tîn dibe, bil ji Evîn û Mey û Bilûrê!!

Min digot wê evîna Mujde perdeyekê bihavêje ser bîranînên min, lê ne wisa bû, vê buharê arîya hezar rojên jibîrkinê da alî û pêt xuyabûn, hezar rojin ku evîna jale 103

di dil de tê meyandin, hezar carî roj hilatîye û çûye ava, lê ev evîna xedar hîç ji singa ezmanê dilê min danagere. îcar ez serxweş bibim, dîn bibim, biçim ber kevirê her çak û ziyaretê, bibim peyrewê Emîral axa û parsa avê li çayxaneyan jî bikim, rewa û sezaye.

Mujde razayî ye, rûyê wê li ber tava hîvê xewnek e efsaneyî aram û nazik e, porê wê yê weke şeveke havînê kin kerîyek karikên reş e li dawa çiyayê palgeha min diçêrin, memika wê ya çepê xwe ji bin lihêfê dizîye û di ronîya hîvê de xwe dişo.

Berî kêlîkekê, şoreşek li ser text teqîya, şoreşa ku ez berî sal û nîvekê tê de beşdar bûm li ber wê, çirûskeke.

Herdu bedenên me nema ji hev dihatin naskirin, axînan dîwarên odayê mest kirin, guldan ji ser mase yê pekîya, kaxezên bîranînên min bûne quling û di odayê de firîyan.

Xwedê tenê dizane çawa min ev aska nazik ajote tora

livînan, ew dudilî bû, dixwest lê nediwêrî, her digot:  
Badîn dîn nebe, berê zivistan bû, berfê alî me dikir û  
nedihişt tu kes ji mal derkeve, lê niha !! buhar e û tu dizanî  
Mehabadî mîna perwaneyan di buharê de difirrin, li mal  
rûnanin. Ji xwe Kerîm pê bihese kuştina min tê de ye.

-Mujde behaneyan ji bin çenga xwe dernexîne, tu bi  
hesanî dikarî ebayekê li xwe bigerînî û berçavkê deynî ser  
rûyê xwe, kî wê te nas bike!

Erê ma Stalîn axa tenê taktîk û Stratecîk dizane, min jî  
Mujde bi Taktîkekê anî mal, ro jî li nîvro bû, li çayxaneyê  
jî ez gelekî nemam, min êşa serî kire behane û berî da  
kanîya gezo û çemê hingiv.

Lêvên min weke xwedayekî şareza ji nû bedena wê ya  
genimgûnî afirand, pêçiyên min yên ji nivîsandinê  
westîyabûn, li dora memikan weke hacîyan zîvirîn, har  
bûbûn, deşt û newal û berîyên germ dipelandin û tîpin ji  
agir dineqîşandin, tevnek bû ew beden ta bi ta tilîyên min  
ew jenand. Ez....

104

Xewa min tê, firişteya min di nav nivînê de ye û ez  
dinivîsim û cigareyan dikêşim!! Çi dînbûne ev!! ezê biçim  
enîya şerê xwe yê tenê tê de kul û derdên min têne kuştin,  
hevalên min jî niha li Seqizê, di paş çeper û kozikan de ne  
û ji serma diranên wan dikin sîrkesîrk. Ew komarê  
diparêzin, ez jî vî dilê westîyayî ji êrîşa bîranînên dijwar  
diparêzim.

\* \* \*

Piştî min ji Mujde re got ebayê li xwe bigerîne û di pêş

min de biçe mal, ez dagerîyam çayxaneyê, Hejar û  
Hêmin jî li wir bûn, mirov li ku be wan bi hev re dibîne,  
heta ku Hejar ber rojava diçe îzgehê jî Hêmin li gel wî  
diçe, ez li rex wan li ser kursîyekê rûniştim, çend deqe  
neçûn Kerîm jî hat.

Çayger bêyî ku ji me bipirse hûn çî dixwazin, çar  
fincanên qehweyê li ber me danîn. Çar Kurd û çar  
fincanên qehwê bêdeng li hev rûniştibûn, Kerîm bi rûyekî  
tirş qutîya tûtînê ji ber min kişand û cixareyek pêça.

Hejar da ku qeşa ya bêdengîyê bişikîne, bi berken got:  
wa dîyar e mişkan zimanê me kurisandîye!!

Min bi dengekî nizim got: na...lê hestên di dil de ne barê  
zimanin.

Hêmin qurtek e nazik li qehwe ya xwe xist û got: rast e,  
ziman bêkêr e li ber hestên dil, gelek caran pêûs bi  
seetan di nav tilîyên min yên xwêdan dayî de lal dimîne,  
gelo çî raz e!?

Kerîmê rûtirş mizek li cigareya xwe ya sistpêçayî xist û bê  
yî ku li tu kesî binêre got: ziman wergêrekî qels e ji nalîna  
hinavan re, her ku bûyer mezin be, ziman bêtir lal dibe.

dema serheng Newrozî, Simiko şemitand tora mirinê,  
Simiko neaxivî, tenê tilîya xwe di birîna xwe da kir û li  
ser pêşbenda xwe ya spî nivîsî: Êykaş.

Min û herdû helbestvanan pirsî: Êykaş yanî xwezî, lê  
xwezî çî.!?

105

Weke her gavê ji nişkê ve Emîral axa li ser serê me  
rawestîya û got:

-xwezî deryayek e me hebûya.

Satila xwe danî ser mase yê û destê xwe di ser serê min re bir û got: her kurdek tê kuştin, gotina wî ya dawî Xwezî ye, lê ez nahêlim Pêşewa bibêje xwezî, eger rê gelekî li Komarê teng bû, wê Pêşewa li gemîyekê siwar be û xwe bigihîne peravin dûr.

Me her çaran ava li ber xwe rûkira satila wî û dîsa bêdeng man . soza min bi Mujde re hebû, ez bawesşkîyam û min lêborîn xwest û got: hûn dizanin ez van rojan gelekî li dibistanê diwestim, serê min diêşe û xewa min tê.

Kerîm kenîya weke ku plana min naskiribe û got: Badîn evîndar narazin. Lê min bi kenekî sivik lê vegerand û got: eger ez evîndarbûma, wê dawîya min weke ya Heme Resûl bûya.

\* \* \*

Sadiq Behadîn hevalê min yê zarotî yê nameyan ji min qut nake, em ji zû de hevalê hev in û me temenekî xweş bi hev re derbas kir, ew bi salekê ji min mezin tir bû, lê em bi hev re derbasî xwendegeha camîya Amêdî yê bûn, her ku ez Hejar û Hêmin dibînim, hevaltîya min û wî tê bîra min, dema me xwendina xwe ya seretayî li wê camîyê kuta kir xortanîya me nû dest pêkiribû, em bi hev re dil diketin yek keçikê û berî ji camîyê derkevin em li zikakan digerîyan heta lingê me diwerimîn. Sala 32 an me xwendin qedand û divabû em herin Mûsilê berdewam bikin, lê ne min ne jî wî me nikarîbû ji ber xizanîyê. Rojekê hate mala me û got: Badîn were em kar bikin!!

-karê çi sadiqê mala Kûtazade?(bi vî navî dihatin

naskirin). Pîrka min pirsî.

-hikûmet rêyekê di navbera Amêdîyê û gundê Bêbadê de vedike, karkir divên û dibêjin her karkirek mehê du Dînanan distîne.

106

Min û wî me kar kir, heta rê bi tamamî vebû, me gelek pere bi dest xistin, lê destên me yên terr û nazik êdî bûbûn destên mêran, zivr û hişk û stûr!!

Pişt re em çûn Mûsilê me xwendina navendî li wir qedand, ew gelekî jîr bû û mehîya wî Dînar û nîvek bû, ji xwendin û kitêban pirr hez dikir, di nav xwendevanan de navê wî bûbû mişkê reş, ji ber ku ew her dem bi ser kitêbên xwe de xwar dibû û haya wî ji bayê felekê nebû.

Dema xwendina me li wir qedîya , wî berê xwe da Bexdê û li Dar El Muelimîn xwend, ez jî vegeyîyam Amêdîyê. Me nema hevdu dît heta ez çûme Silêmanî, ew li Helebç bûbû mamosteyê Cografîya û di zarê Soranî de bûbû bilbilekî zimanrewan!!

Îro nameya wî ghişte destê min:

hemşarê delal Badîn.

Nameya te ya xemgîn kete destê min, weke ez te nas dikim, tişte di te de nehatîye guhertin, lê ka bibêje tu kengî bûyî fîlosof?! Tu qala mirinê dikî û dibêjî: ez dixwazim bi nivîsandinê pêşberîya mirinê bikim.!

Ma tu nizanî Badîn ku serkêşîya li himber mirinê vala ye!?

Tu niha tê digihîjî ku zindî hemî bi gavin lezok berê wan li mirinê ye! Tu jîyana xwe (weke te nivîsî ye) mîna tûyê dara hewşa we ya li Amêdî yê dadiweşînî ser rûpelan, ma



ev bi xwe ne amadebûne e ji mirinê re. ?

Ê min bi xwe ez razî me ji halê xwe, mamostetîya min baş diçe, min xaniyê xwe yê berê bi yekî dî re guherî, kirê niha erzantir e û xanî jî nêzîktirî dibistanê ye, ez ji zû de neçûme Silêmanî, lê min ji hemkarekî xwe bihîst ku Jale ji London vegeyîyaye, Xanzada Hewlêrî ji berê xerabtir e, hîç li min napirse. Lê ez di evînê de ne weke te qelsim, û ya ku li min nepirse, ez wê mîna firek ava tehl dihesibînim, ma gunehe ku ez kurmancim?! Xanzad di nav henekan re digot: em Hewlêrî bi Kurmancên reş re 107

nazewicin! Nezewice heyran, here bi ingilîzên çavşîn û porzer re bizewive, kê bi destê te girtî ye.!?

Komar çawaye gelo? Em dibihîzin ku Stalîn wê komarê bi neftê re biguhere, eger neft nebe wê bi komirê re biguhere, ma komar mirov germ dikin yan komir!! Xwedê tenê dizane bê çi tevn ji Kurdan re tê ristin!

Ez jî dinivîsim, lê ne weke te li ser jîyana xwe, ji xwe tiştêkî hêja di jîyana min de nîne, lê ez gotaran li ser edeba Kurdî ya kilasîk dinivîsim, bi taybetî li ser helbestvanê me yên Kurmanc. Ma ne gunehe ji xwedê yên weke şêx Ehmedê Cezerî, Xalid axayê Zîbarî û şêx Nûreddînê Birîvkanî neyên naskirin!! û def û zirne tenê ji Salim û Herîq û yên dî re lêkevin!?

Kes li van deveran wan helbestvanên me nas nake, me jî yên van deveran nasnedikiri, ez nizanim çima ev qas bend û sînor hatine danîn û kê danîne!?

Badîn bîna araqîyê ji rûpelên te difûrîya, hinekî meyxurîyê

kêm bike, Jale ne hêjaye tu xwe ji bo wê bikujî, heyfa helbestvanekî weke te. Tu dibêjî tu û mamostayeke Kurd ku bi koka xwe ji Bayezîdê ye ji hev hez dikin (Mujde ya Celalî), tu hîn çî dixwazî, koka wê biajo dibe ku nevîya Ehmedê Xanî bi xwe be!!

Heta demeke din bimîne di xweşîyê de, silav li dost û hemkarên te.

Têbînî:

-1hibrîya Mûsilê hazir e û wê heftîyek e dî bighîje destê te.

Pîrka te silavan ji te re dişîne, berî demekê ez çûme Amêdîyê û min ew li ser niga dît.

Sadiq Behadînê Amêdî- Helebçe Nîsan- 1945

Îro dema ez ji dergehê dibistanê derketim, bazirganekî Mehabadî ev name da destê min û got: çend rojên dî ezê biçim Silêmanî, eger bersiva te hazir be ezê bi xwe re bibim. Min nameya Sadiq bi rê de xwend, tiştêkî bala min 108

nekişand bil ji Jale: ev birîn nayê hev, min di ber xwe de got û berê xwe da Studyo.

\* \* \*

-kurê gamêşê simbêlên te weke qeytanên cizmeyên efseranin. Gunehê min çîye? Ezê simbêlên weke yê Stalîn ji berzika pîrka xwe ji te re bihûnim!!

-çî bûye kalo, simbêlên kê.?

Weke ku dengê min nebihîst, di hêrsa xwe de ma û got: xwedê ev simbêlên weke terîya mişkan dane te ma ezê bi çî stûr bikim, her yekî tê fotoyekî xwe dikişîne, ji devereke xwe ne razî ye, ev dibêje te çena min zirav derxistîye, ev

dibêje pozê min ne ew qasî mezin e, hûn rûyekî xweşik û sipehî dixwazin herin hesab bi xwedê re bibînin, ez fotokêşim û ne mecbûrim şaşîyên xwedê rast bikim. Sibe tiştêk bi serê Komarê were wê bibêjin: sûcê Rûsan bû, tim û tim milletên belengaz li darbenekî ji derveyî malê digerin da ku şaşîyên xwe pê ve daleqînin.

-Merema te çîye kalo?! Min bi dengekî ku nerazîbûn tê de xuyabû got, lê kalkê min çavên xwe ji fotoyê di nav destê xwe de ranekirin û got: Badîn tu jî bese lo, her ku tu têyî studyo, tu min ji çermê min derdixî! Merema min çîye? Merema min ew e ku simbêlên yekî ziravik bin ez stûr nakim, fotokêşî derewan qebûl nake, rastîya xelkê şanî wan dike.

Hêdî hêdî hêrsa wî daket û berê xwe da koşka tarî û ez jî li pey wî çûm, ristika ku foto li ser daliqandibû êdî ji esîdê riziya bû, çend Rîyal ji berîka xwe derxistin û got: here Ristikeke naylon bikirre, ristikên kêndirê xwe li ber esîdê nagirin, hemî qetîyan, tu dibêjî qey ez generalan li ser datînim.

Kalê werîsfiroş di kûranîya dikana xwe de bû, weke her gav werîsek dihûna û badida, piştî silavê min gotê: xwezî min zanîbûya tu çî dikî?! Hema tu vî werîsî badidî û dihûnî. weke her gavê bêyî ku serê xwe rake, got: te bi

109  
xwe got xortê nîv Ermenî, hema ez werîs dihûnim û badidim, tu nizanî bê çiqas kar bi van werîsên min pêk tîn, tevgera civakê tev li ser werîsan e, ker û dermale pê têne girêdan, û dînen weke te pê bi stûnên tekyexaneyan girê

didin, piştîyên qirş û êzingan û barê qantiran pê têne şidandin, top pê têne kişandin, ji bo dewl û satilên ku pê avê ji bîran derdixin, gemîyan pê li qeraxê benderan radiwestînin. Vê jî bibihîze: li stûye mirovan jî tê pêçan. Min çend metir werîs ê ziravik kurrîn û ez bi tirs derketim. Bîna kebabê ji studyo difûrîya. kalkê min, hîn ez li derve bûm bang kir: were kurê min were, tu niha ji nêzan mirî. -na kalo, ez ji tirsan mirim. Û min gotinên wî kalî jê re gotin, kalkê min kenekî dîn kir û got: kurê min te jê re bigota: bostek werîsê goştê stûr li ba kalkê min heye dikeve dîya te, de bixwe kurê min bixwe, û bextê xwe nehavêje û bibêje: kebabên mehabad ji yê Silêmanîyê ne xweştirin!?

-erê kalo , her tiştên Mehabad ji yê silêmanîyê xweştirin, lê evîn li Silêmanîyê xweştir bû!! Wî weke ku bersiva min nebihîstibe got: qessab çima ji berxan hez dike Badîn?

-Bexê nêr ji bo kêr.

-Rehme li dê û bavê te, îcar te fêhm kir çima Rûs ji komara te hez dikin!?

-Ne mumkine ji bo berjewndîyekê be kalo, ev qas alîkarî bi me re kirin.

-Mumkin e bexê min, mumkin e. li Ermenan jî wisa kirin, em qelew kirin û qiloçê me tûj kirin ji bo di zikê Tirkan ra bikin, em jî ne li ser hişê xwe bûn. Taşnaq maşnaq jî bi xelkê kenîyan, û gotin Rûs birayên me ne, Arsozoksin wê alî me bikin û pišta me bigrin, û çend tivingên zenggirtî dane destê me û ya ullah û ya xwedê. Çi bû? Tu dizanî çî bû ne!! Milyon û nêvek hatin kuştin û

yên mayî li welatan belav bûn, niha li Tirkîye yê tu  
Ermenîyekî jî nabînî, dilê Rûsan bi me şewitî, kolxoz û

110

Sofxoz û quzê kerê ji me re ava kirin, mala xelkê  
şewitandin, ma te nebihîst bê çiqas Ermenî revîyan  
Emerîkayê?! Êdî nema kesî got: ax Hayistan! Masês dilê  
Hayistanê ye! Her Ermenekî Masêsek li ba xwe bilind kir,  
niha Studyo ya min û ev şûşeyên Vodka Masêsa minin.  
Ez nizamim çima kalkê min ev gotin li yek haweyî gotin!!  
Tu munasebe nebûn, lê xuyaye ew gelekî aloz û dilteng e,  
lê ez nizamim çima.!?

Jale li Silêmanîyê ye!! Xwedêyo tu çima birîna min nêzîkî  
min dikî!?

Ey dil

Ey koçerê bê zozan û germîyan

De li warê kozê vegere

Ma tu ne westîyayî ji konvegirtinê!?

Te çend bihar li pê xwe şewitandin?

Çend kuçik li dora xwelîya vemirî te li pê xwe hêlan!!

Tu van birînan li dû xwe dikişkişînî, mîna laşên  
berateyan!!

Ey hespê ku li ber sînoran dilukumî

Tê heta kengî bibezi!?

Ey hespê dîn

Ey hespê bê siwar.!!

\* \* \*

Rûs ji Mehabad derketin û hîn berf a li lûtkeyên Qûl qulax  
û Xezayî û Daşa Mecîd û Lendî şêxan ne helîyaye.

Xelk kêfxweşin bi derketina Rûsan, lê maldarên ku piştî  
kuştina Xefûr Mehmûdyan revîya bûn hîn nevegerîyane,  
hîn bawerîya wan bi komarê nehatîye, li gor peymanan  
wê Rûs ji tevaya xaka Îranê derkevin, û piştî xwe bidin  
komarê, aaax xwezî ev tiştên diqewimin xewn bin!!  
Duh şemateyeke gewre li Çarçira hebû, pêşmerge li  
Qehrawe bi sereketibûn û pêncî serbazên dîl di kamyonekê

111

de bi xwe re anîne bajêr, xelk li du alîyên kolana pehlewî  
û şahpûr rawestîyabûn û ji serbazên dîl re dikenîyan.  
Ji nişkêve dengê kalkê min li pişt min hat: ev xelk weke  
yê nû dest bi Vodka kiribe, bi qedehekê re serxweş bûne!  
Di fikra wan de kela fetih kirine.

Min bi payedarî jê re got: kalo hîn tu çî dixwazî, komarek  
e sê mehî bi artêşa dewletekê re şer bike û bi ser keve, ma  
hindik e?!. kalkê min Kamêre ya xwe hilgirt û çend  
fotoyên xelkê û serbazên dîl kişandin û li min zîvirî:  
porê min di bûyerên wisa de spî bûye Bado!! Min gelek  
caran dîtîye li bajarekî sibehê alek li ba dibû, êvarê yek e  
dî.

Min nedixwest ew wê kêfxweşîya min li min biherimîne,  
ez rabûm û bi alî qutabîyekî xwe ve çûm ku alek biçûk di  
destê wî de bû û her carê dihat tala min û bi fedî li min  
dinihêrî.

Mujde ne xuyabû, dibe ku li wir bû jî lê ji ber ku jin hemû  
bi ebayên reş hatibûn min ew nas nekir, asoya rojava sor  
bûbû, ewrin sêwî roj hembêz dikirin, rojê jî weke ku  
nedixwest li wan serbazên dîl binêre bi lez xwe berda pişt

çiyê.

Serbazên dîl ne weke dîlên ku min di fîlmên sînemayê de dîtibûn, ew hemî dev li ken bûn û hinekan destên xwe yên ne girêdayî ji me re li ba dikirin.

-sê ribê van Kurdin.

-ev Êsoyê Mengûr e.

-evê han Xizirê nalbend e ji êla Mameş.

-Heme Pîrê Herkî jî di nav wan de ye.

-gelo ew ne Reşîdê Dîbokrî ye.!?

Dengê çend kesan li rex min dihat, Dîl şanî hev dikirin.

Kapitan Nûrî Emîn û Mistefa Xoşnaw jî bi dîlan re hatibûn, min ev yek nizanîbû, lê êvarê dema min dêlîya tirî ya li nivê hewşa xwe av dida, dengê Jîpekê li ber derî hat, Nûrî Emîn ji şofêrê xwe yê Ermenî re got: tu here

112

karê xwe. û derbasî hewşê bû, bêyî ku silavê bike bi rûyekî geş got: te dît Bado, Barzanîyan çi huner kirin!! Ê tûrekî biçûk yê şekir li ber min danî (şekir kê m peyda dibe û buhaye, ji xwe yê hûr û spî yekcar peyda nabe, yê ku heye qend e û kirtikên mezinin û dema dixwazin çay vexwin dişikînin û davêjin devên xwe û pişt re qurtan li çayê dixin.)

Wê şevê wî serpêhatîya şerê Qehrawe ji min re got:

)em li pişt kozik û çeperên xwe bûn vê sibê, dema yekî Feyzullabegî hat û ragihand ku hêzeke leşkerî ji artêşa dewletê bi seroketîya serheng Kisre yê Sinendecî bi rê de ne, şeşsed serbaz di gel wî ne û çend topên giran jî bi wan re ne, bi wê meşa xwe wê nêzîkî nivro bigihên paygehê.

Me rabû xwe amade kir û pêşmerge li rojavayî rêya Seqizê belav kirin, Mistefa Xoşnaw ferman bi dengê bihîstî da: bila pêçiyên we li ser tetikan bin, nefesa xwe bigrin û berê lûleyan bidin nava serbazan û ber jor, ji we hat nîşanî dil bikin, dema we peyva AGIR bihîst, biteqînin, bila gulleyên we vala neçin, emê îro şanî Hemeriza bikin ku pêşmerge komarê diparêzin, ne artêşa sor.

Serbaz û efseran barê xwe danîn û li rex çemekî rûniştin, gelean ji wan xwe li ser çîmenê kesk ramedandin, bîna tûtina ku di cixareyên wan de dişewitî dihate me, dengê stranên wan tev li xiştixîsta darên çinar û bî û behîv û hirmîyan dibû. Tu nema bû em gupgupa dilê wan jî bibihîzin.

-AGIR.

Mistefa Xoşnaw bi dengê xwe yê qebe ferman da, du sed tivingî bi hev re lîlandin û mîna pezê ku gur têkevê, serbaz çep û rast bezîyan, nizanibûn çî mesele ye!! Dema hişê wan hate serê wan û fêm kirin ku ketine kemînekê bezîyane çekên xwe, lê qehremanên me destûr nedane wan, û termên bîst û yek serbazî hate raxistin, nêzîka bîstan jî birîndar bûn, yên mayî jî kes nizane bi çî awayî

113

birîndarên xwe rakirin û bazdan, ev pêncî serbazên ku me ew dîl kirin jî weke dînan li wan hatibû, berê xwe dane pêşmergeyan û destên xwe bilinkiribûn û bi lav û nîyaz digotin: teslîm teslîm. Me du Metralyoz û çar hezar fîşek jî bi dest xwe xistin, binêre! û Nûrî fîşekek ji berîka sakoyê xwe yê leşkerî derxist û şanî min kir û got:



ezê vê fîşekê weke yadigarê Qehrawe bi xwe re bihêlim.  
Min bi devekî ji hev li wî guhdar dikir û şerê ku berî sal û  
nîvekê ez tê de beşdar bûm hate bîra min.

\* \* \*

li silêmanîyê, piştî ku êdî nema rojnameya JÎN derket, şê  
û şeyda bûm, Hîwa jî bi nakokîyên di nava baskên xwe de  
ez dilteng kiribûm, rastgiran nedihîştin kes tev li refên  
têkoşerên Barzanî bibe, her digotin: Ingilîz di şer de ne,  
eger em jî li vir têkevin şer bi hikûmeta iraqê ya ku  
hevbendê wane, tê wê wateyê ku em destbirakê Hitler in,  
ev jî ji me ne kême!

Çepgiran jî berê kevçî didane Mosko. Di gel vê yekê jî  
gelek ji endamên Hîwa tev li şoreşê bûn, yê min jî zû bi  
zû destê min ji Silêmanîyê nedibû

-I hope I see you again one day, may be we that way  
again!

Ev hevoka Ingilîzî gotina Jale ya dawî bû, dema me xatir  
ji hev xwest, wê romana The Vergin and The Gipsy ya  
D.H. Laurance ji ber kiribû:

-we must live in The Hopes.

Rojekê ji min re got.

Ez jî heta dawî di pirrika hêvîyan de mam, li pey rewrewk  
û leylandê diçûm û her tî dimam.

Min helbestên xwe dihinartin kovara Gelawêj û her ku  
hijmarek dihat min çavê xwe li navê xwe digerand û ne  
didît.

-Birayîm Ehmed ji zarê kurmancî nefret dike, û ji tîpên  
latînî dîn dibe, Sadiq Behadîn rojekê ji min re got.

-ezê helbestên xwe bişînim Hawar ya Mîr Celadet.  
şer li enîya Barzan hinekî sar bû, ingilîzan sar kir, soz  
dane Kurdan ku mektebên Kurdî li Barzan vekin, rêyan  
biçirrînin, wezîrên Kurd tev li kabîneya hikûmetê bikin,  
erzaqan bişînin herêmê û...

Macid Mistefa bûbû mirîşka hêk di qûnê de, nîgek li  
Bexda yek li Barzan , bi wê çûn û hatina xwe tevna xapan  
dirist û derew dihûnandin. Dibe ku haya wî jî bi xwe ji  
meselê nebû û bi dilekî saf dixebitî.

-Xudanê Barzan li herêmê vegeşîya.

Sibata 1944 an bû, ez çûme Kerkûkê beşdarî konfransa  
Hîwa bûm, berf dibarîya, berfeke weke van rûpelên li ber  
minr raxistî, berfeke bêdeng weke minalên di pêçekên  
xwe de razayî. Hawîr min berf bû. Agirê Babagurgur  
nedîşî wê berfê bihelîne, berfê nedikarî agirê dilê min  
vemirîne. Weke evîna min bû ew berf, lê segên berdayî  
ew dilewitandin. Berfeke Kurd bû tijî raz, saw, xewn û  
serhişkî û inad.

Hîwa bûbû werîsekî rizîyayî, di bin giranîya nakokîyan de  
qetîya, tayekî xav bû ji tizbîya rêxistinê re, dane dane ji  
hev dûrketin. Hinek heval û dost bi dora min ketin.

-Were singa komonistan ji me re vekirîye. Emê tev li  
refê wan bibin, ew dibêjin emê xortan bişînin Mosko!

-Barzan nêzîktir e.

-emê herin meydana sor, di bin ala sor ya weke xwînê  
germ û bi hêrs de bijîn.

-ezê tev li partîya xwînê bibim.

Sadiq Behadîn jî weke melayekî pendên xwe li ber min radixistin û digot: Badîn dîn nebe, heyfa te , tu mirovekî xwendevanî, pêdivîya kurdan bi zanîne heye bêtir ji xwîne.

-lûleya tivingê zanîna rasteqîn e.

-wax wax, te çi zû ji bîr kir! Ma ne tu bûyî te xwendekar li hewşa dibistana navendî ya Mûsilê li xwe dicivandin û ji 115

wan re digot: çend salên dî emê vegerin Amêdiyê û bibin mamoste û bi Kurdî waneyan bibêjin!?

-ew xewnên zarotîyê bûn.

-Niha jî tu di xewnên xortanîyê de yî, tu hîn ji xewnan derneketî.

-na , ez di hêvîyan de me ne xewnan.

-dema hêvî pêk neyên, dibin xewn.

-Sadiq, tu ders û waneyên cografyayê ji zarokên Helbçe re dibêjî, lê ka were , were bila çiya te fêrî rêyên azadîyê bikin, bila newal û gelî ji te re bibêjin Bakur li ku ye, bila lûtke bêjine te serfirazî bi çi rengî ye, cografya ya li ser pelan sar û bê wate ye Sadiq. were emê bi xwîna xwe sînorekî ji bo azadîya xwe bikêşin.

Ne Sadiq bi ya min kir û ne min bi ya wî kir, di cografya jîne de, her yekî ji me li pey stêrkekê çû, û rêyên me ji hev cuda bûn.

Berf helîya, hîwa jî helîya, lê evîna min ne bû berfek, ne jî biharek bû ku dilê min pê geş biba.

Wê biharê, bihara 45 an, Nûrî Seîd bi Macid Mistefa re hate Kurdistanê, xwe weke kurdekî ji xelkê re pêşkêş

dikir, eve rovîtiya dijmin, her ku em hinekî bi ser dikevin  
û werîs li stûyê wan teng dikin, nizanim nijadekî kurdî ji  
ku peyda dikin !! gelo Stalîn jî ne digot ez kurdim!?

Min xatir ji silêmanîyê xwest, ji çayxaneyan, ji kolan û  
şeqaman, ji dibistanan, ji Pîremegrûn û Qeredax, ji  
hevalên Hîwa, dostên min yên di kovara Jîn de, ji odeya  
xwe ya ku bîna hinneyê jê ne diçû, bîna henasên jale jî  
xwe li dîwarên wê mîna lavlavan gerandibûn, min ji dilê  
xwe jî xatir xwest.

Bi evînek e herifî, kivil û wêran, bi bêrîkek e vala û bi  
hêvîyên mezin, bi xewnên ku min li pişt dilê xwe  
barkiribûn, min Silêmanî li pey xwe hişt.

\* \* \*

116

Mehabad 6 gulanê 1946

-ezê biçim bayê ji xefkan derînim!

-ba!!

-erê ba, hin ba jî hene ez dê wan biajom xefkan. weke tu  
çawa bayê nabînî tu xefkên bayê jî nabînî, binêre singa te  
ne xefkek e ji xefkên bayê?! komara me jî ne bayeke di  
xefkên hirçê sor de!?

-na Kerîm na, komar ne di xefkan de ye, dilê me ye yê ji  
ber pencên xefkan diperpîte.

-Dil jî baye, evîn jî ba ye, xewn, şoreş, mêjû, imperatorî,  
û xwedê û her tişt ba ye.

Û Kerîmê Şikakî mîna bayekî bakurî girîya.

Min di hêsrên wî re li her du zarokên wî yên bi hewa  
ketibûn dinihêrî, wê çawa ev zilam ji hirçan hez bike!?

kêlîkek di wê navê re çû, kela dilê wî hinekî sar bû, destê  
xwe dirêjî Idareyi Duxaniyati Mehabad kir û got:

tûtina Mehabad difiroşin!!

şeş kemyonê Rûsî li ber avahîyê rêz bûbûn, qirtepirta  
şofêran bû, ziman li bin guhê hev diketin, Rûsî Azerî,  
Ermenî, kesî tişteke ji wan fêhm nedikir, lê xuyabû ji  
bizavên destên wan ku li ser barkirinê li hev nakin, her  
yek dibêje ezê berê bar bikim.

-ev tûtin têra Rûsan hezar salî dike.

Dengekî kal li pişt me hat. Xwêdan bi ser enîyên  
hembalan ketibû, rûyê wan tirş palêtên Tûtinê li ser piştên  
wan, ji dergeha Idareyi Duxaniyat derdiketin.

-mamoste tu jî tûtina xwe nafiroşî. Dîsa ew dengê kal hat,  
min destê xwe avête berîka xwe û li qutîya bavê xwe  
peland, qutî di bêdengîya berîka min de lûsîya bû, li  
jêdera deng zîvirîm, min dît kalekî simêl zer cixareyekê  
dipêçe û bi dilbijandineke ecêb li palêtên tûtinê dinihêre,  
dema çavên min û wî li hev ketin min jê re got: ma kes  
bîranînan difiroşe? kenîya, kuxîya nêzîkî min bû û got:

117

were ya dawî kurê min, mirov hestîyê bavê xwe jî  
difiroşe.

şeş kamyonên Zîl ji Tewrêzê, du Tatra jî ji Miyanduabê  
gihîştin: wax wax wax, tu dibêjî qey wê Rûs vê tûtinê ji  
qantirên xwe re bikin êm! ma ne axirzeman e! Rûsya  
tûtinê ji Mehabad dikire?! Kalo got, lê yekî dî hat li rex  
wî rûnişt û got: çima Mehabad çavê te danagire? ew jî  
komareke ji komarên xwedê, ala wê jî heye, artêş jî heye,

pêşewayekî me jî heye, çima wê tûtina me nebe?! Ha!!  
Kalê yekem lê vegerand: ê de bila hinek tûtin li me  
belvabikin, ma zekata tûtinê jî tune gelo?! Kalê dî bi tinazî  
bersiva wî da: kuro eger zekata aqil hebûya min dê hinek  
dabûya te, ma tu dînî!! Kê gotîye te tûtin wexta pêximber  
eleyhi salam hebû!! ma di Quranê de te sûret eltûtin  
xwendîye!!

Û her du kalan cixareyên ziravik ji xwe re pêçan û dû bi  
ser xwe û axaftina xwe xistin.

Ji dûr ve Emîral axa xuya kir, satila wî ya nîv tije di destê  
wî de û zilamek jî li rex wî tûrek li mil ber bi Idareyi  
Duxaniyat dihatin, dema gihiştin tala derî Emîral Axa  
satila xwe danî û destê xwe yê çepê xiste navbera du  
bişkokên sixmeyê xwe û rep rawestîya û bi dengekî xeniqî  
qîrîya: Mehabad bê derya nabe, niha ew benderek bûya,  
wê tûtin li gemîyan barbikirana.

Min li wî zilamê bi Emîral axa re dinihêrî, wî jî li min  
nihêrî, ji nişkê ve qîrîya: Badîîn û xwe avête hemêza  
min, tûrê wî ji ser milê wî ket û hineyeke mîna bihareke  
hêrayî li erdê rijîya, êdî nema bîna tûtinê dihat.

\* \* \*

Berî ku ez dostê xwe Hisênê Dêrsimî bibînim, duh bîna  
hineyê li odeya min belav bûbû, min digot, ew cîrana min  
xûşka Heme resûl e hevîrekî hinnê ji xwe re distirê, min  
bîra Dêrsimîyê xwe nedibir, ew bi xwe bîna hinnê her  
118

dem di pêşîya xwe de dişîne, bîna hinnê gellaciya wî dike  
weke çawa kulîlk biharekê ilan dikan.

-Dêrsim winda bûye!!

wî tûrê xwe li ber kulavê raxistî danî û got.

-ma bajar winda dibin!!

lê weke ku pirsî min nebihîstibe, berdewam kir:

Dêrsim pîr bûbû, porê wê spî bûbû, ne berf bû li ser çiyayên wê, porê wê yê spî bû xuya dikir, dema ez çûm porê wê hinne bikim min ew nedît ! min pirsî xwe dîsa kir : ma bajar winda dibin!?

-erê, çawa hinne piştî çend şoyan ji por diçe, weha jî bajar, piştî çend şoreşan winda dibin.

-û Mehabad!?

-eger Stalîn Axa tûtina wê neecibîne, wê winda bibe.

-û eger eciband!?

-heta têra cixareyekê tûtin hebe, wê bimîne.

Dîsa min bi tirs li tûtina qutîya bavê xwe nihêrî, di cihê xwe de bû. Mêvanê min yê Dêrsimî cixareyek pêça û hinek hinne berda nava tûtinê û got: gelo kî kê dişewitîne, hinne yan tûtin!!!!!!

Niha ew di xewa şêrîn de ye, bayekî hênik di pencereya bakur re derbasî odeyê dibe, kanîn xefkên te Kerîm!?

Kalkê min nîvro hatîye mala min û rûpelek li dû xwe hiştîye, tê de bi Farisî nivîsîye: neveê ezîzem Badîn, ferda şeb biya mey bixorîm, În furset ra fewt nemîkunê. Sibe pêncşeme, ezê Mujde bibînim û herim Gerekî Hermenîyan.

\* \* \*

7gulanê piştî nîvro

min Mujde dît, rûyê wê çilmisî bû, gava çav li min ket,

lêvên xwe qermiçandin û rûyê xwe bada.

-Mujde giyan bibûre, ez berî çend rojan li hevketî bûm.

-tu lihevketî bî, tê dilê min bihêlî!!

119

-nejî yê ku dilê te bihêle, û min baqek gulên Muhemmedî dane destê wê.

-ev çi gulî? Bîna hinnê ji wan tê!!

-ev bîna Dêrsimê ye.

Berî çend rojan min dilê Mujde hişt, ew diçû çakên Mehabad (li vir ji ziyaretgehan re dibêjin Çak) wê yek nehişt û neçûyê, çakî Qolqulax, çakî Babexelîfe, çakî Çikole, çakî Xezayî. Tê bîra min, li Amêdiyê keç û xort diçûne ziyaretgehan û dua dikirin, ji welîyan dixwestin miradên dilan pêk bînin, yek caran jî keç û xortan ava şor vedixwarin û tî radizan da ku di xewnê de dilber û evîndarên xwe nas bikin, digotin eger yek tî têkeve xew, di xewnê de wê mehbûbê wî were avê bide destê wî, hin jin jî diçûn zarok ji gorên welîyan dixwestin, her ziyaretek ya tiştêkî bû. Li gundekî nêzîkî Bamernî şêxek hebû, digotinê şêxê şîr, xelkê pere didane wî da ku ji çêlek û sewalên wan re dua bike û bi şîr bibin, bawerîya min bi van tiştan nedihat, kê ji min bixwesta ez bawerîyê bînim, min digot: herin li bizina şêxê şîr seh bikin, eger we dilopek şîr di guhanê wê de dît, ezê bawerîyê bi welîyan bînim.

Dema min gotê ev çîye Mujde! Tu weke pîrên

Mehabadîyan diçî ziyaretgehên ku kes nizane çi di bin axa wan de veşartîye ? got : ez dixwazim evîna min û te



nemire ! diçim mûman vêdixim û ji welîyan tika dikim ku xwedê te ji min re bihêle.

-dînê ma wê welî çi bikin ?! wan di axa wan de bihêle.

-Badîn, tu weke Tûdeyî yên bê îman diaxivî, te parî bi endamên Demokrat Firqesî re firandine. Min bi tûjî gote wê: tiving min diparêze, ne welîyên te yên hestîyên wan bûne xwelî. Lê wê jî bi hişkî bersiv da û got: ev bawerîya min e, tu jî di bawerîya xwe de bimîne ! lê min jê re got: Ma ne tu endama Yekîtiya jinên demokratî! ma ne Mîna xanim tu dabûyî pêş û gotibû : bila Mujde berpîrsa

120

çalakîyên hunerî be, tu bi Kubra Ezîmî û Xecîc xanim re rûdinî, ne layiqe mejîyê te mîna yê pîran be.

Ew xeyidî û bêyî ku xatir bixwaze piştta xwe da min, ez vala nebûm ku wê aşt bikim.

Îro dema min gul dane destê wê, kenîya û got: tu dizanî dilê min weke berfa Eraratê saf e, ez nikarim ji te bixeyidim.

-Mujde ezê herim mala kalkê xwe, tujî diçî?

-na. civîna me jinan li Merkezî ferheng heye, wê kevanîya Pêşewa Mîna xanim bi xwe were civînê.

-lê berî tu biçî ezê mizigînekê ji te re bibêjim.

-mizgîn!!

-vê pêncşemê ezê herim camiya Ebbas axa, û mele Sedîq Sidqî bi xwe re bînim da ku mehra me bibire.

-na, ez ji vî meleyê rîgijj nefret dikim, xelk dibêjin ew zîlamê dewletê ye! mele Qadirê Sûceyî mirovekî qenc e, wî bîne.

-imamê camiya Hacî Ehmed!?

-erê, bûk û zavayên Mehabadê tev li ba wî mehrên xwe dibirin, dibêjin ku jin û mêrê mehra xwe li ba wî dibirin, tu carî hev bernadin.

-û Mele sedîq Sidqî?

-ew yê telqîna mirîyane, Ezrayîl xwe li dengê wî digre. Ez kenîyam û min di dilê xwe de gotê, tu dev ji van bawerîyên xwe bernadî. Mujde weke perwaneyekê, berê xwe da Merkezî ferheng.

\* \* \*

odeya kalkê min tijî şûşeyên vala ye, bêdeng xwe dane rex hev, dema wî bala xwe da min ku ez ziq li wan dinêrim got: ev termên serxweşîyê ne.

-Te evqas mey vexwarîye?

-ji wan bêtir, ev ne tiştekin, her şûşeyek çîrokeke, ev şûşe - destê xwe dirêjî yeke kûpikî kir- meya Bordeaux e, min di salên Heme Reşîdê Baneyî de, ji serbazekî ingilîzî  
121

kirî, û ev - ber bi çend şûşeyên qehwerengî ve çû- Bîra ya Almanî ye ji Frankfort hatîye, berî Hitler xwe bikuje, min deh şûşe ji karmendekî li balyozxane ya Almanya li Tehranê kirîn.

-û ev?

-ev wîskî ye dehşikê min, ji min re ji Kirmanşahê hat, efserekî Ingilîzî bi destê yekî ji êla Sofîwend hatibû kuştin, dema wî ehmeqê sofîwendî paltoyê efsêr jê kir, ev sê şûşe, di bêrîka hindir ya paltoyê leşkerî de dîtin, binêre!! Skotlandî ne û ji serdema qiralê Ingilîz Georg ê

pêncemînin. Dostekî min yê Ermen li wir hebû, her sê şûşe bi deh şahîyan kirîn.

-û palto!?

-palto! Paltoyê çi!?

-paltoyê efserê Ingilîzî.

-wî zilamê Sofîwendî du salan li xwe kir, paşê tê de hate kuştin, yekî ji Celîlwendan ew kuşt û paltoyê bi şeş gulleyan qul bûbû, ji xwe re bir, ew jî hate kuştin, dibêjin niha ew palto di Mûzexaneyê London de ye, bûye weke bêjîngê. hemû jî gunehê wîskî ye, bê guman efserê feqîr bi hesreta vexwarinê çû. Eger wî tenê qurtek jê vexwaribûya, bêguman nedimir.

-Û ev.

-ev jî şûşeyên Vodka ne, li vê seh bike!! Te bejnên keçikan jî wisa nazik dîtine!! Ev vodka di sala Mele Xelîlê Gorawmerî de bi dest min ketin, wî Meleyî ji bo kumên Pehlewî ji holê rake şer fikir, xelk bi hev ketin, sînor mîna siya dîwarekî di rojê havînê de kin û dirêj dibûn, ez jî li pey şûşeyan diketim, wê demê min bazirganekî Azerî nas dikir, tûtin bi qaçaxî derbasî wî alî sînor dikir, her ku dihat Vodkayeke giran ji min re dianî. Haya min ji dinyayê nîne, tenê ez mijûlî wênekêşanê û meyê me.

-lê tu gelek tiştan jî dizanî!

122

-sûcê şerê berî sal û nîvekê ye, di destpêka şer de min radyoyek ji qaçaxçiyekî kirrî, yeke Abdurrehman Zebîhî jî wisa hebû, wî nûçe dibihîstin û li nav xelkê belav dikirin. bihîstina nûçeyên cîhanê bû kurmek û weke meyxurîyê,

min nema dev jê berda, tu dizanî çî mey û nûçeyan digihîne hev?

-çî?

-herdu jî mirov gêj dikin.

Kalkê min du qedeh li ber xwe danîn û şûşeya konyakê da destê min:

-Badîn veke, lezzeta vekirina şûşeyan ne kêmî ya keçekê ye.

Min her du qedeh dagirtin, kalkê min bi qurtekê re qedeha xwe rûkire hindirê xwe.

-kalo gamaz gamaz, tê xwe biêşînî, konyak girane!!

lê wî guh li min nekir û qedeha xwe ya dî jî dagirt, min dîsa jê re got: gamaz gamaz kalo, ev bûne du qedeh!

-tu bi Ermenî jî dizanî kurê gamêşê, ne bêje hêdî hêdî, yê serxweşîyê bixwaze qedehan najimêre.

Hinekî rawestiya, weke ku tiştêkî bîne bîra xwe, paşê berê xwe da radyo ya li ser kursiyeye xêzeran û got: tu dizanî çî dibe ? êdî komara te pîr dibe û roja wê diçe ava!! lê min bi singbilindî bersiva wî da : ma ne duh bû, pêşmergeyan çend dîl ji artêşa Pehlewî anîne Mehabad, te ew nedîtin ? te çî zû Qehrawe ji bîr kir!!?

-min ew dîtin, û min fotoyên wan jî kişandin, lê nexape kurê min, henek bi hirç re nabin !!qey te nebihîst André Gromîko nûnerê Rûsan li yekîtîya neteweyan çî got dema jê pirsîn: tu çî li ser rewşa Îranê dibêjî?

-na ez wî qasî li radyoyên biyanî guhdar nakim.

-ji ber ku tu naxwazî rastîyê bibihîzî, wî got : în yek mesele daxilî Îran mîbaşed ve ma heqî dexalet der umûri

daxilî kişverhayî dîger ra nedarîm!!

123

de binêre li vî hirçî ! dibêje ev meseleyek hindirê Îran e û mafê me nîne em di kar û barên dewletên dî yên hindirîn de xeber bidin !!de bêje ma henek bi van hirçan re dibin?

-çawa nabin, tê bîra min rojê cejna qurbanê ez li Mûsilê bûm, yekî keldanî hirçek kedî kiribû û ew direqisand.

-Lê ev hirçê ez behsa wî dikim, hirçê Sîbîrya ye, li şûna bireqise, bi dawa mirov de dimîze, çûn û hatineke bi guman dibe, çavê xwe veke, Rûs dîwarekî kavile.

Demoqrat Firqesî jî qûna hikûmetê dialêse, wê niha komara te weke şaxekî ter li ber bayekî hov bihêlin, tê bibînî !! bi diwazdeh hezar pêşmerge nexape, qeder werîsekî zivir ji stûyê komarê re dirêse, eger hinekî xeleka werîs teng bibe, wê êlên Mamiş û Mengûr û Dîbokrî û Herkî û nizanim çi têkevin hemêza Heme Riza, de vexwe, vexwe siyaset gûye, vexwe.

-te sozek dabû min

-erê berxê min, ez pirr sozan didim, kîjan soz?

-mala Sultan û...

-û Xanimê, tu eceleyî? Emê sibe biçin, bila xelk li nûçeyên Rehman Uweysî û Hejar guhdarî bikin, tu jî li ahînen Sultana cihû.

Kalkê min hinekî bêdeng ma, pişt re rabû derziya radyo zîvirand bi alî BBC ya beşê Farisî.. Inca Lenden est, radyoyê BBC û nûçe herikîn.

-te dît! Navbera Tehran û Mosko çi xweş dibe!! Vaye wê Rûs imtiyaza şirketek Petrolê bistînin, bêguman wê

bermîlekê bi ser komarê da bikin û agir berdinê.

-kalo ew qas tesîra Rûsan li ser komara me nîne, vir ne Azerbaycan e. mî bi nigê xwe û bizin bi nigê xwe.

-û kerên wek te jî bi du guhên bel û terîya xwe. çawa tesîra wan nîne, tu nizanî di destpêkê de ji bo xatirê çavên Stalîn erd li zengînan teng kirin, Xefûr kuştin, mala seyid Camî Ceferî jî çend rojan dorpêç kiribûn, heta mêrik xwe bi sî û pênc hezar tûmen kirrî, tu di guhê gê de  
124

yî, nayê bîra te ku ne Emerxanê Şikak bûya wê mîrza Rehmet Şafiî jî bikuştana!?

-erê tê bîra min, lê digotin ew casûs e.

-kî malê wî hebe casûs e !! casûsê kîjan newalê bû, kerengo!!

Kalkê min bi çavekî dî li rewşê dinihêre, gelo çi raze? Tu kes wî naêşîne, û komar ne weke ku ew dibêje, ew zora zêde jî li maldaran nebûye, weke ku li Azerbaycanê dibe, xelk razî ne û bi vê azadîya xwe şad û xweşhalin. Lê eger tiştêkî nerewa dibe jî, sûcê Rûsa ye, weke kalkê min dibêje, tiliya xwe dixin her qulekê.

Kalkê min serxweş bû, ez jî hêdî hêdî serxweş dibûm, nema zanim çawa ketim xew.

\* \* \*

di pencereya rojhilat re dêlîya tirî xuya dike, ronîya hîva çarde şevî bi ser de weke mûmeke helîyayî herikîye, dareke bi saw e, şaxên wê razin efsaneyî di xwe de vedişêrin, darên Mehabad hemî şîn hatine û kulîkên wan teqîyane, dara min tenê bi buharê nehesîyaye!!

Hîv jî weke ku dixwaze tişteki ji min re bibêje, awirin tijî tirs li pencereya min dide, gotinê falbêjekê ji Silêmanîyê têne bîra min: hîv temam bibe, temenê te jî temam dibe, ev bûye çil hîv ji wê demê de temam dibin, hîn jî ez weke xwe me, Mehabad jî ango şarê hîvê, gelo mebesta falbêjê ev bû.!!

Her ku şev diçe tarî tir dibe, weke çayeke tîr bi ser Mehabad de dirije ev şev. Qutîya min ya tûtînê ronîyeke xemgîn dide, bêriya tilîyên min kirîye. Wax vaye tûtîn kêmbûye, gelo Rûs neketibin qutîya min jî.

\* \* \*

em -ez û kalkê xwe- çûne mala Sultanê, berî em li derî bidin, kalkê min rawestîya û li dora xwe nihêrî, weke yekî hesaban ji hinekan bike, pişt re dema dît tu kes li dor me 125

nîne, lingê xwe yê rastê li erdê da û bi dengê xeniqî got: ha li vir Xefûr Mehmûdyan kuştin! li ber çavên min.

çend çipik xwîna sor ji ber sola kalkê min pekîyan.

Ber roj ava bû, min porê xwe li ber neynikê dişkinî, du kes derbas bûn û gotin: sê qedeh Araqî amade bike. Min pirsî: qedeha sêyem bo kê ye? Wan bi zirzî gotin: tê niha nas bikî. Ez çûm û min di pencereya odeyê re li zikaka bi berfê xemilî bû nihêrî, Xefûr Mehmûdyan bi bejna xwe ya bilind û du kes pê re ji alî avahîya şehrdarîyê dihatin, zikak vala û tihî bûn, xelk li çayxaneyan bûn û li nûçeyê seet pênc guhdarî dikirin. Wan du kesan Xefûr dorpêç kirin û lûleyên demançeyên xwe xistin serê wî rebenî, teqîna sê gulleyan tenê hat, û Xefûr mîna lokekî deveyan hate

xwarê, li ser berfê ramedîya devê wî ji hev ma û bi çavin  
beloq li ezman nihêrî. Hinekî xwe bi erdê re xijiqand lê zû  
sar bû û nema livîya.

Sultana Cihû, bûyer hêdî hêdî digot, weke ku li fîlmekî  
binêre, kalkê min jî destê xwe li gerdena wê pêçabû û  
memikên wê difirkandin.

-min qedehên araqîyê li ber herduyan danîn û bêdeng  
mam, yekî ji wan bi Rûsî pirsî: te xêre Sultanê, çi bûye!?

Min bi tirs lê vegerand: min mirina li ser berfê dît! Ew  
zilam kenîya û bi dengê qalind got:

xeraço...xeraço.

-Yê Rûsî kîbû.

Min jî bi tirs ji Sultanê pirsî. Berî ew devê xwe veke,  
kalkê min bersiv da: Nemaz Eîlyof bû.

-pişt re?

-yek ji wanên ku Mehmûdyan kuştin derbas bû û bi  
dengê lerizî û Farisîyek hişk got: tema şud.

-pişt re?

-tiştekan nebû, her kes çû mala xwe, û ziravê zikê  
dewlemendan qetîya.

126

-xuyaye raste kalo, li vê komarê tiliya Rûsan di her qulê  
de ye.

-erê dehşikê min, de hay ji qula qûna xwe jî hebe.

Dema em vegeirîyan, derengî şevê, serê min gêj bûbû,  
kalkê min bi rê de pirsî: te şeraba wê eciband ? ew ji tirîyê  
rezên Okrayêna bû, bi sedan nazikên wê derê di payîzan  
de û li ber ahengên okordyonan, li ber tava rojeke



xwedayî, tirî diperçiqînin û dimeyînin, te hilmeke mê ji şerabê ne dikir!?

Lê ez ne di şerabê de difikirîm, ez di wê xwînê de ku li ser berfa spî, li kûçey Cûlekan berî çend mehan rijîyabû, difikirîm.

Berî ez ji kalkê xwe qut bibim û vegerim mal, min pirsî: kalo me Xanimê nedît !! kenîya, destê xwe di ser serê min re bir û devê xwe xiste guhê min û got: ew çûye nêçîrê. -nêçîrê!?

-sibe, sibe were em herin wir, tê fam bikî. Lê vî porê xwe yê weke gevera dînan hinekî kin bike. dibêjî qey tu dewrêşekî Qadirîyanî.

\* \* \*

20Gulan 1946

min îro porê xwe li cem Buyuk axa yê Xanbaxî, yê berber kur kir, ew ne tenê berber e, lê li gelek şanoyên ku li Mehabad hatin lîstin jî, weke lîstikvanekî jîr û şareza, gelek rol lîstine, wî kursîyeke nizmik li ber derê mexazeyekê di koşeya dikanekê de li bin siya darekê danîbû, û mirêkeke kevnik ku nîvê zîbeqa wê çûbû û bi perwazeke rizîyayî ji textê guwîzê, da destê min. dema min li xwe nihêrî, rûyê min weke ku ne yê min be, ziravokî û kirêt bûbû, min di dilê xwe de got: komara me jî êdî weha dibe. ez bêdeng mam, lê Buyuk axa, weke her berberî, pirrbêjek bû, çîrok û serpêhatî û bûyer ji hev qut 127

nedikirin, dibêjî qey guhê min bi kirê biribû, di gel ku bi sê çar salan ji min biçûk tir bû, lê mîna kalemêrekî xeber

didan û di ber kurkirina porê min re strana (şêrîn teşî dirêsi) dinihirand, her kêlîkekê çeqçeqa meqesê radiwestand û pirsek dikir: te bihîst Emerxanê Şikak çekdarên xwe ajotine eniya Seqizê?

-erê min bihîst.

Mûyê qusandî weke baraneke reş li bin lingên min diherikî, xavika spî ya ku li dora stûyê min gerandibû êdî belek bûbû.

-te bihîst Mihemed Nanewazade kuştin? Ew nûnerê komarê bû û tim diçû Seqizê, teyara wî teqandin, wax li minê, heyfe ew mêr weha bimre, lê mirina li ezman ne çêtir e ji ya li erdê?

-erê çêtir e. ez wî nas dikim û bi cenazeyê wî re jî meşîyam, lê tenê komek komir bû.

-demokrat Firqesî xwe nêzîkî dewletê dikin, te bihîst ku Cafer Pêşwarî berî çend rojan li Tehran bû? Tu li radyoya Tewrêzê guhdarî dikî? Çeq çeq çeq.....dengê meqesa wî jî weke awazeke mûzîkê dihat.

-te bihîst şerek di navbera Barzanîyan û hêzeke ji artêşa Îranê qewimî?

-li Seqizê!

-erê, û serwan Xusrewî tê de hate kuştin.

-rehma xwedê ne lê be.

-ew Kurdekî ji Sine bû.

Li dû wê, berber xwe bi ser min de xwar kir û devê xwe xiste guhê min weke yekî ku razeke veşartî dibêje: wê pêşmerge êrîşî Kirmanşah û Sine bikin, artêşa Îranê westîyaye, bêhêz bûye, lê aaaax ne Rûs bûna, bawer

bike heta Abadan jî rê vekirîye.

Camêr porê min ediland, û gava min destê xwe avête  
berîka xwe ku pere derxim, bezîya û bi xurtî destê min  
guvaşt û got: meazellah, ji te we ye ez te nas nakim

128

mamoste Badîn?! Min sond xwarîye ji pêşmergeyan û  
mamosteyan heqdestê xwe nagrim.

\* \* \*

Eme umrêke awarem le xakî to Suleymanî

Hezaran heyfe em umrem ke çon fewta be talanî.

Erê bûye umrek ez dûrî silêmanîyê ketime, lê her û her di  
dil de ye ew şar, ew kolan û zikak û der û dor, ew çiya, û  
ba û ewr û dîmenên xwezayê, ew evîna dojahîn.

Ez li Mûsilê jî hinekî mame, û li Hewlêr û û Dihokê jî, lê  
wî şarî çî anî serê min!!ez di çiyên re derxistim.

Nizanim çawa destê min ji Silêmanîyê bû, di gel ku Jale  
ne lê bû jî, lê sebra min û hedana vî dilî bi şopên lingê wê  
û henasên wê yên ku li odeya min daliqiyayî mabûn,  
dihat, sebra min bi jenandina dilê min li ber kevan û jihê  
evîna xedar dihat.

Ez çend kîlometran bi bakur de çûm, pişt re dagerîyam ser  
rêya Çemçemal, hevalên me yên ku dev ji Hîwa berdidan,  
û tevî Barzanîyan dibûn, hemî li wir dicivîyan, û ji wir  
berê xwe didane Koysenceqê, Raniye, Rewandizê û  
hildikişiyên çiya, min jî di dilê xwe de digot: wê agirê  
çiyê giyanê min ji zengara evîne bişo, ez bi rê de diçûm,  
di nava gelîyên kûr û hîmên weke dêwan de, gotina Sadiq  
ya dawî ji min re kirî her di guhê min de dikire zingînî:

xwedê te poşman neke.

-Ma ne jîyan tev poşmanîyeke dirêje!! Min jê re got û ew hemêz kir, dawî bêyî ku ez bihêlim hêsirên min bibîne, min got: Sadiq, xwedê hebînî tu yek serîyan li odeya min bide, û nehêle nalînên min û bîna Jale jê bar bike.

Ji nişkê ve, nizanim ji ku hêzeke hevkar Iraqî û Ingilîzî kete pêşîya min, lûleyên neh Manlişeran ez dorpêç kirim û ez ji dest hilanîn ketim.

-destê xwe bilind ke û raweste, tu bilivî, em te dikujjin!1 weke mişkê pisîkekê li ser serê xwe bibîne ez rawestîyam, du serbazên reşik ber bi min ve hatin û bi çepelên min girtin

129  
û kelepçe kirin, dema ez bi sarbûna kelpçeyê li ser destê xwe hesîyam, evîna jale hate bîra min.

-tu casûsê Almanya yî!

di wê demê de, nizanim li kîjan gundî, Almanan casûsekî xwe bi baraşotê avêtibûn û ew ketibû destê Ingilîzan, êdî ji her kesê ku bi tenê di rêyekê de dimeşîya guman dikirin, kêfa wan serbazan ji nêçîreke weke min re gelekî hat, wan rastî bawer dikir ku ez casûsim, dest girêdayî ez avêtim dawîya jîpeke leşkerî li wê nêzîkê rawestîya bû û berê min dane zindana Emara.

Min rojin reş li wê zindanê bûrandin, roja yekem mohra tilîyên destên min birin û porê min kin kirin heta ku çermê serê min xuya bû, çi tiştê bi min re hebû li ber derîyê hebsê ji min standin, heta seeta min û qeytanên sola min û qayîşa panteron, sê rojan ez li zindana Emara mam, min sebra xwe bi sipîyan dianî, nizanim çi zû xwe gihandin

bedena min?! dostanîyek di navbera min û wan de çêbû,  
dema celladan ez diazirandim, çendek ji wan di laşê min  
de dihatin kuştin, girîyê min bi wan dihat û min termikên  
wan yê perçiqî di qelşên odeya biçûk de (odeya razanê bû,  
û min tê de dixwar û destava xwe jî lê fikir, min nikaribû  
xwe tê de dirêj bikira, hema rûniştî diketim xew, lê ew jî  
ne xew, weke xewa guran bi çavekî şiyar bûm û bi yekî  
radizam) vedişartin.

Ez li ber xwe û birînên xwe nediketim bi qasî ku li ber  
wan dostên xwe yên mîna kunciyên qeşartî diketim, dema  
girtîyekî sipîyek di navbera du nenûkên xwe de  
diperçiqand, û dengê qirçînîyê ji odeya rex min dihat,  
qirçînî ji dilê min jî dihat. Ev dilovanîya ji hed der, ji alî  
diya min Hamêst gihaye min, pîrka min digot: ew jinik  
melayiket bû, dilekî xwedayî li ser bû, wê genim - de îcar  
bi zor me dixwar- dibir û li ber mûristanan direşand û  
digot: mûrî gunehin, gelekî diwestin, bila genim li nêzîkî  
wan be da ku di bin lingan de neperçiqin!!

130

Roja dawî kalekî Ereba ji Besrayê gote min: xorto vê  
dilovanîya te fam nakim, ma tu nizanî ev sipî dijminê me  
ne?

-çima çî bi me kirine?

-Ew jî Ingilîzin, xwîna me dimijin, bawer bike ew  
ingilîzin, tu çavên wan yên şîn nabînî!!?

Roja sêyem, yekî derî li min vekir û got: Badîn kurê  
Ûnisê Amêdî derkeve, biryara derxistina te ji vir hatîye,  
min ji kêfan bawer nekir û hatim ku wî ramûsim, lê kêfa

min du deqeyan nedomand, serbazê rûtirş kêfa di rûyê  
min de bişkivî bû xeniqand û got: emê te bibin zindana  
Mûsilê. Û çavgirtî ez avêtim otomîlekê, ji dengê wê  
xuyabû ku jîpeke leşkerî bû.

Min pirr nivîsî, û ji bîr kir ku sibe ez divê bi kalkê xwe re  
biçim mala Sultanê. Xwedê bike Mujde pê nehese, Ezê  
niha razim, ev bayê hênik ku ji çiyayên Mehabadê weke  
sûlaveke nedîtî û nermik tê xwarê, xewa xwedê jî tîne.

\* \* \*

Îşev ez bawerim wê pênuşa min bilikume, wê lal bibe,  
yan jî wê bibe hespekî ku siwarê xwe winda kiribe, aware  
bibe û her û her bide cirêdê, li çolên birînan û deştên  
bîranînan û evraz û nişûvên evînek e gawir û mîna neqşên  
di kevîran de kolayî de bigere. Ev çi rojêke efsaneyî bû!!  
Ne di romanên de, ne di Fîlman de, ne jî di çîrokên  
pîrikan de rojêke weha qewimîye. Ez bi xwe heta niha  
bawer nakim ku bûyer rastî cirîya ye!! Ne mumkine, hîç  
ne mumkine, xewne gelo?! Heta niha jî ez bi ser xwe ve  
nehatime.

Erê ez serxweş bûm, lê ez çendî serxweş dibim hinek hiş  
di serê min de dimîne, têra min û ji hevderxistina tayê reş  
û spî dike, dizanim çi dibe, Ji xwe xewn jî xuyane, xeyal  
jî weha. Lê ev roj!!

Berî deh deqeyan ez ghiştime mal, di cîde xwarî pelên  
xwe yên spî bûm, dixwazim vê bûyerê di xefka nivîsînê de  
131

deynim, hîn tenûra hişê min germ e divê ez nanê  
bîranînan lêxim. ditirsim dîmenek yan peyvek ji axaftinê,

yan jî kurtedemek di wê navê de winda bibe. Nivîsandin tenê dikare gewdeyên bîranînan weke Mûmîyayên Misrîyan bi hezarê salan biparêze.

Min Jale dît!!! Erê Jale, ne ku ez şaş dinivîsim, Jale bi hilm û henasên xwe, bi bejn û bala xwe, bi bedena xwe ya nerm û nazik û weke penêrê Koçeran spî, lê di Kirasekî dî de.

Ezê ji kêlîka yekem de dest pê bikim, da ku ji bîr neçin ew deqeyên ji hestên ji agir û hêsr û hêrs û hesretên pêknehatî.

Ez bi kalkê xwe re çûme mala Sulatanê, roj jî diçû ava, lê ez !! ez diçûm jivana agir!! Ez diçûm da ku kivilên evîna xwe bibînim, û ji nûve destana birînan vekim.

Çawa em derbasî hindirê odeya Sultanê bûn, bîneke naskirî dihat, bîna volkanekê, etûnekê, dojehekê dihat.

Dengê Frank Sînatra ji gramafona li ser iskemleyekê li rex pencereya bi perdeyên stûr û tarî nuxamtî dihat, straneke ku min berê bihîstibû û jê hez nedikir.

Di serî de Sultanê du qedehên Araqîyê dane ber me, kalkê min bi şehweteke dirrinde çavek da Sultanê û got: ka te ji vî xortê tî re çi amade kirîye ? Sultanê kenîya û got:

yeke li gor dilê wî yê xemgîn, wê niha were!!

Û weke bahozekê Jale derbas bû!! kirasekî sor û tenik ku bedena wê ya zelal hemû tê re xuyabû, û bi rûyekî sar mîna mirinê! nizanim çawa min qedeha xwe kire yek qurt û rabûme ser piyan!çavên me li hev ketin û min nema ber xwe dît: Jale.

-navê wê Elsa ye, te jale ji ku anî? Sultanê di ber kenekî

tijî qerf û tinazî re got.

Lê ma ez Jale nas nakim, ma ez wê bedena nerm nas nakim, ma ez wan henasên biharîn nas nakim, ma ez wê xençera ku kûr di dilê min re çûye nas nakim!!! ew jale  
132

bû, Jale ya ku dilê min li ser sêla sincirî ya sozên xwe, weke nanekî tenik şewitand.

Wê guh li matmayîna min nekir, weke ku rastî ne Jale be, bi devekî ji hev li min nihêrî û berê xwe da odeyeke dî. Kalkê min kenîya û got: kero tu her keçeke xweşik dibînî, ji te we ye jale ye, de tûj bike û here ez mêranîya te bibînim!!

Weke berxika bide pey qessab, ez li pey wê çûm, ew li kevîyê textekî hesin rûniştîbû, û di mirêkeke destan re li rûyê xwe dinêrî, bi mûçingekê birûyên xwe radikirin. min nizanîbû ez çi bikim, yan çi bibêjim! hema li ber wê serçok bûm û min bi destê wê girt.

-Jale!

-erê ez Jale me, de rabe xwe neke Romyo, çi ku ez bi xwe ne Jolyêt im. Ê kirasê xwe hêdî hêdî danî. Araqî di serê min de gerîyabû, min jî qayîşa panteronê xwe vekir, lê wê bi destê min girt û bi sarbûn got: pêncî Qiran ji bo carekê!!!

-Jale!

-weke te bihîst, pêncî qiran.

Min pêncî Qiran yên ku ji bo abonetîya salekê ji rojnameya Kurdistan re amade kiribûn, ji berîka panteronê nîvşemitî derxistin û dane destê wê, îcar wê bi xwe kincên



min ji min danîn û ez kişandim ser text.

Çi laşekî sar bû di bin min de dihejîya! Çi lêvên ji qeşayê bûn, bîna sedan mêr ji bedena wê dihat, zevîyekî bi hezarê caran hatibû cotkirin ew laş, şopa sedan gîsn li ser ranên wê xuyabûn. hêsrên min li nava herdu memikên wê diherikîn û hestên min weke agirekî di dawîya xwe de, êdî dû dikirin.

Xwarî nav lingên min bû û çavên xwe hildan: ev jî bi pênc Qiranî, tu amadeyî! Û bêyî ku ez bibêjim: erê, dest bi alastinê kir, ez mijandim! Bi neynûkên xwe yên tûj û dirêj pişt min birîn kir, porê wê yê zêrîn bi ser min de herikî  
133

bû, min axînên xwe weke xençeran dadiqurtandin, gewrîya min zuwa bû, xwêdana ku bi ser min ketibû bi desmalekê zuwa kir û ez kişandim tala mirêkeke dirêj li pişt derîyê odayê.

-ezê te har bikim.

Lê ez har nebûm, min nedikarî tiştek bikira, mêranîya min bi ku de çû ez nizamim. ji wê kêlîkê de, Jale ya ku bûbû dirdirk bi dilê min ve, xwe berda, pêjna wî agirê efsaneyî di dilê min de nema. Kemêlek bû bi postê min ve, min bi hevringa jibîrkinê ew qusand.

Bêdeng min xwe gihande text, wê jî kirasê xwe yê tenik, yê li binîya text weke poşmanîyekê kombûyî, li xwe kir û hat li rex min rûnişt û pirseke weke havîneke zuha avête navbera min û xwe:

-Badîn!! Tu hîn ji min hez dikî?

Zimanê min hat ku bibêje erê, lê dilê min qêrîya: na na,

min ji yeke dî hez fikir, ne tu bûyî, tu ne Jale yî, tu ne tu yî. Û min rûyê xwe xiste nav herdu destên xwe û girîyam. Pêncî Qiranên ku min dabûnê li min veğerandin û bi ken got: bigre pereyên xwe, ez bê keda xwe pereyan nastînim. Û bi bêşermiyêke layiqî qehpeyekê got: bi gelek kesan re wisa bûye, ne xem e.

Nayê bîra min ez çawa ji odeyê derketim, nayê bîra min ez çawa gihame mal, lê ez dizanim, îro ew evîna min ya ku min xwe pê paye fikir, weke berxekî serjêbû!

\* \* \*

25Gulan 1946

bûne çend roj min dest neavêtîye pênûsê, ne jî çûme çayxaneyê, ne jî studyo ne jî dibistanê, rîya min rûyê min reş kirîye, qutîya min jî ji wê şevê de nema xuyaye, ez bê cixare mame, lê êdî pê dihesim ku çîyayekî giran ji ser dilê min rabû, ji zû de divabû dilê min bawer bikira ku Jale ne evîna min e, bawerîya ku bihurîna salan nikarîbû  
134

bi min re çê bikira, di kêlîkekê de ez gihamê, di destpêkê de ez heta hestîyên xwe dîn bûm, weke yekî bawer neke ezîzekî wî bimire, lê ez hîn tê nagihim çawa Jale gihaye vir, li çi digere, kê ew şandîye û çima ew yek anî serê min? di van rojan de kalkê min carekê hate ba min, weke her carê bû, digot: te jîyan fam nekirîye, tu weke dînekî ji mala sultanê revîyayî, orîna gayekî ji te dihat, kuro ma Elsa çi bi te kir!! tu yî yê ku li çîyan tivingê hildigrî milên xwe û xwe pêşmerge dibînî!!tu nikarî jinekê bixî zefta xwe tê çawa welatan rizgar bikî?!! kalkê min çîrokê

nizane, dilê wî jî bûye kirtikek komir.

-dîno te hişt ew keçik jî ji wir bazbide, Sultanê dibêje min dixwest wê bixebitînim, û min dê gelek pere ji pey qûna wê ciwanê qezenc bikirana, lê vî nevîyê te yê dîn mala min xira kir.

-kalo rast bibêje, kê ew anî wir?

-Xanimê, hevala Sultanê ew ji Tehranê anî, ji balyozxaneyê Ingilîzan, ew keçeke Ingilîz bû, lê şeytan bi qûna te de mîz kir û li ber çavê te kire yeke dî, tu serxweş bûyî, araqîya sultanê giran bû.

-qutîya min , ya bavê min ne xuyaye kalo.

-ez li ku dixim û deng ji ku tê?! qutîya te çû, wê bi xwe re bir, got: ji dînekî weha yadigarek pêwiste!!

\* \* \*

Ezê îro bîranînên xwe yên zindana Mûsilê binivîsim, bûyerin balkêş tê de qewimîn û min tê de mirovekî hêja nas kir, ku nehişt ez bi giraniya rojên girtîxaneyê bihesim. Kêlîka ez gihame girtîxaneyê, çavên min vekirin û dîsa li ber dergehê mezin, serbazekî Kildanî seeta destê min û qayîşa panteron û qeytanên solên min û nasnameya min ji min standin û xistin tûrikekî û di cih de ez ajotim bîro ya gerînendeyê girtîxaneyê, ew zilamekî porsipî qelew û çavreş bû, hinekî dilovan jî xuyabû, bi nermî pirsî:

135

kurê min netirse û rastîyê bibêje çêtire! ne serê min biêşîne û ne yê xwe, de ka bibêje Almanan çi ji te xwestine?

Min dîsa gotinên xwe dubare kirin û bi şerefa xwe sond xwar ku ez ne casûsim û ji Almanya hez nakim. Yekî

rûzirav li pişt maseyeke kevnîk gotinên me dinivîsandin, piştî nîv seetê, gerînendeyê dilovan got: niha here cihê xwe, pişt re emê binêrin û rastîyê nas bikin. Û bi dengê tijî ferman û sert gote wî karmendê rûziravîk: mohra tilîyên wî bistîne.

Girtîxaneyê ku ez lê bûm, nêzîka çil kesî tê de dihêwirîn, diz û talançî, mêrkuj û girtîyên namûsê, sextekar û komonîst û dîndar û her cûre xelk hebûn. Di koşeyê nêzîkî derî de du zindanî yên di temenê min de hebûn, gava çavên min cara yekem li wan ketin min tê derxist ku sûcê wan giran e, rîya herduyan dirêj bûbû, ofeofa yekî ji wan bû diçû û dihat, erdê ew nedigirt, ji nerîna yekê min guman kir ku yekî inglîz e, mûyê wî zer û çavî şîn li ser wî bûn û xuyabû ku ji maleke mezin e. min bela xwe di wan neda û li cihê xwe xemgîn rûniştim. Yê mûzer hate ber min û bi Kurdî got: pismam gunehê te çî ye!?

Dema ew bi Kurdî axivî, ez sar bûm û min bêhemdî xwe pirsî: ma tu Kurdî? kenîya, rêza diranên wî yên spî weke libên birinca Silêmanîyê xuyakir. Hevalê wî nêzîk bû û got: erê ez xulam, Kurd e, kurdê Sûrya ye.

Min ji şêweyê axaftina hevalê wî nas kir ku Behdînî ye, lê axaftina yê mû zer li ser guhên min nû bû.

-navê min Ehmed e, ez ji Zaxo me, ev jî Nureddîn e.

-ez Badînim, ji Amêdyê me.

Pişt re min berê xwe da yê mû zer (Nûreddîn) û min nû bersiva wî da: ew ji min re dibêjin tu casûsê Almanya yî!

herduyan li hev nihêrin û bi yek dengî gotin: gunehê me jî

ev e.

136

Nûreddîn da ku ji nêzîk ve şoreşê nas bike û agahîyan li ser şerê azadîyê yê ku Barzanî li dar xistibû bibe ji Kurdên Sûrî re, bi qaçaxî sînor derbas kiribû, lê piştî çend seetan hatibû girtin bi hevalê xwe Ehmed re. Kurdekî netirs bû û tu kesî nikarîbû çavên wî bişikîne, ew gelekî kete dilê min û min derd û kulên xwe pê ji bîr kirin, ji min re li ser kovara Hawar ya Celadet Bedirxan xeber dida, gelekî pesnê civaka edebî li şamê dida, min helbestek du helbestên xwe xistin destê wî û jê rica kir: belkî tu wan biweşînî ! dema dît ku min bi tîpên Latînî nivîsîne çavên wî sekinîn û got: tu ji ku fêrî van tîpan bûyî!? min jî çîroka xwe û tîpan jê re got, dema ku bazirganekî ji kurdên Sûrî hatibû zaxo û rojnameyeke hawar bi xwe re anî bû, min xwe fêrî wan tîpan kiribû, serê xwe hejand û dilê min xiste cih: bê guman wê bêne weşandin, ma ne bi tîpên Latînî ne!!

ji destpêkê de em li hev ewle bûn, weke ku ji kevin de em hev nas dikin, her şev me civat digerland û diketin gotûbêjên siyasî û edebî, Nûreddîn digot: eger ez ji zindanê derkevim û bi selametî li Qamişlo vegerim, ez rojbuhêrên xwe yên zindanê hemî dikim çîrok! ez dikenîyam û min digot: welleh êdî helbestek jî bi min re dernakeve, eger bixwazim binivîsim jî, ev pêşî û kêzikên vê havîna gawir nahêlin.

Piştî du rojan du şervanên Barzanî jî hatin zindanê, bi serbilindî diçûn û dihatin û gelekî lome li me dikirin:

dem ya tiving û şer e, ne ya axaftinên li ser rojname û kaxizan e, dibe ku hûn gelekî zane û jîr bin, lê zanebûn tenê têra we nake, ka ew dilê tijî kîn û hêrs û neyartîya neyaran!! ka ew serkêşî û xwîna germ ya xortan!! Wan gelek tişt li ser Barzanî û tevgera wî ji me re gotin: niha ingilîz ji Kurdan re vala bûne, wan soz dane me ku em agirê şer vênexin wê mafên me bidin, wê dibistanên Kurdî vekin û rewşa aborî ya Kurdistanê baş bikin lê niha 137

piştî ku êdî tirsan wan ji Hitler nema li me qulibîn û dixwazin me bipelêxin. Tirkîya jî bûye destbirakê ingilîzan ew nema êdî madenê Krom didin Almanya, dixwazin Ingilîzan razî bikin, ew jî li ser hesabê me ye.

Nûreddîn hêrs bû û got: hûn dizanin ku Krom ji Kurdistanê derdikeve? Kanên her madenekî giring li Kurdistanin!! Hema li bajarê ku em jê penaber bûn e Maden kanên Sifir û hesin û krom nayên jimartin, êdî Tirk ji kîsê me xwe dikin dostê Ingilîzan, çi dinyayeke bêbexte!!

Yekî ji şervanan got: erê , êdî we fam kir çima em dibêjin dem ya tivingê ye? Hemî li me qulibîne, em jî ji bilî çiyar dostan nabînin.

Di zindanê de min çend rojan xerratî kir, ango ez bûme dartaş, min dar dibirrîn û perwazên derî û pencereyan çêdikirin, rojê heft Fils bi dest min diketin, berdestekî zindanê yê Erebb hebû navê wî Cabir bû, her roj dadiket bajêr û tişt ji zindaniyan re dianîn, dilê min dibijîya vexwarinê min di guhê wî de got: tu dikarî ji min re

şûşeyeke araqî peyda bikî? Li dora xwe nihêrî û bi ken got: berîkê germ bike ava Zemzemê jî heye! çî Filsên ku min derxistibûn min dane wî, êvarê hat û tûrekî reş di destê wî de bû, araqî û hinek qeşa jî anîbû: ev qeşa belaş e, kêfa min ji te re hatîye lê rica dikim nehêle midûrê hebsê agahdar bibe!!

Araqîya bi dizî jê nexweş tir nîne, lê em çî bikin çare nebû, derengî şevê em her pênc heval li dora şûşeyê kom bûn û me ew vala kir. Yekî nîvdîn li wir hebû kesî nizanî bû çima û kengî ketîye hebsê, digot: ez Corcê pêncemînim, yek caran jî digot: ez Fêselim qiralê iraqim û bi meşeke leşkerî diçû û dihat. Dema çav li me ket em vedixwin kenekî hovane kir û got: wey xwelî li serê we be, hûn vedixwin da ku hûn weke min bibin, lê hûn nikarin, binêrin ezê niha çî bikim û derpîyê xwe ji xwe

138

danî û bi xwe de kir, pîsiya xwe rakir û avête Cabirê Ereb: ha ji te re lawê segan, bixwe û dua ji min re bike!! ya dinî rojê nema pêjna wî hat.

Nûreddîn gelekî bêzar bûbû, êdî nema bawer dikir ji zindanê derkeve, dihat ku biteqe, rojekê got: ku ez heta sê rojên dî dernekevim ezê rojîya mirinê bigrim, cara yekem bû ez rojîya mirinê dibihîzim!!

Pêncşeman xelk dihatin serdana xizm û merivên xwe, yê me kes nedihat, ez û Ehmed û Nûreddîn bêxwedî bûn, lê pêncşemekê yek ji hêla Hîwa hat, Hîwa ya ku min guman dikir kevirê wê li ser kevir nemabû.

Berrojaya bû, dema cabir hat û got: Nûreddîn Zaza here

koşka serdanê! Nûreddîn bi kêf rabû û çû, nêzîka seetekê  
em li hêvîya wî man, paşê devliken li me vegeîya û got:  
hûn dizanin kî bû? Elî Hemdî nûnerê Hîwa ji Bexdê.  
Elî Hemdî dostekî min bû, gelek caran di civînên Hîwa  
de, em li hev rast dihatin, lê min tim ew rexne dikir û  
digotê: tu bûyî siya Refîq Hilmî, û bi mejîyê wî difikirî.  
Ew jî dikenîya û bi ner,mî bersiva min dida: ez bibim sî ne  
çêtire ku bibim yekî tî û bidim pey rewrewkê!  
ew xortekî kinik zeîf û rûnerm bû, her ku min rexne lê  
dikir dikenîya û digot: hûn Kurmancên Behdînî  
xwîngermin, gundîtîya we bela serê we ye, ev siyaset e  
Badîn, wek şetrencê ye, divê tu bingehên lîstikê zanibî,  
ne gayê cote ku her gundîyek dikare wî biajo!!  
Pêncşema dî ez jî çûme koşka serdanê, dema ew çav li  
min ket behitî û hema li min nihêrî, da ku wext li me neçe  
min gotê: Ez Badînim, Badîne Amêdî me! Wî jî bi ken  
got: ma te dît serhişkîya te tu ajotî kîjan qulikê!! Paşê  
weke ku pê bihese gotina wî hinekî tehl û tûj hat got:  
xeman nexwin, haya Hîwa ji we heye û ji we re li  
avokatan digere, mesela te hêsane Badîn, lê ya birayê me  
Nûreddîn hinekî zor e, ew bi qaçaxî derbasî Iraqê bûye,  
hûn jî dizanin ku rewş gelekî awarte ye, ingilîz hesabê  
139

casûsan gelekî dikin, xasma piştî casûsekî wan bi baraşotê  
dakete erda iraqê û mixabin li Kurdistanê peyabû li  
maleke Kurdan xwe veşart! Mesele wextê dixwaze.  
Min bi serbilindî jê re got ku ez hema derkevim derveyî  
zindanê berê xwe didim herêma Barzan û tev li hêzên



Mele Mistefa dibim, ew kenîya û got: ne tu tenêyî, gelek ji endamên Hîwa çûn, te kî dît silavan lê bike.

Nûreddîn tê ghişt ku meseleya wî ne rihet e, rabû ji nişkê ve got: ez ji vê deqeyê de dest bi rojîya xwe dikim, çî dibe bila bibe. û bi rûyekî tehl ji koşka serdanê derket.

Heftîya din jîpek ji Bexdayê hat û Nûreddînê rojgirtî û hevalê wî Ehmed birin zindana Bexdê, dema wan xatir ji min xwestin û ez ramûsam, Nûreddîn bi rûyê xwe yê miçiqî berê xwe da min û got: xema helbestan nexwe wê bêne weşandin, ma ne bi tîpên Latînî ne!!?

ez dîsa li xerratîya xwe vegeyîyam da ku xwe ji bîr bikim, min nikarîbû vî kurdê sergerm û xwîn agir ji bîr bikim, çî dil li ser wî bû!! Devê wî jî bi xwarinê nebû!! vîneke min weke ya wî hebûya wê jiyana min bi renekî dî bûya!!

Heftîya dî Cabirê Ereb hat û got: midûr te dixwaze.

Dilê min lêxist û min ji xwe pirsî: gelo xêr e!! û di cî de ez çûme jûrîya wî, rûyê wî li ken bû, berê xwe da min û bi dilovanî got: me tiştêk li ser te isbat nekir, tu ji sîcê casûstîya Almanan bêgunehî, niha dikarî derkevî, pereyên te hene!?

-Erê ezbenî, min di xerratîyê de çend rojan kar kirîye.

Nasnameya min û tiştên min dane min û pend û şîret li min kirin û got: rewş awarte ye kurê min, bila haya te ji te hebe, tu ketibayî nav lepên yekî bê îman wê mala te li mîrata reş bigeranda, lê diya te ji te re dua kiriye, here xwedê bi te re be.

Bê bask ez firîyam, ez azadim , careke dî ez azadim û min berê xwe da rexê Dicle. Bayekî hênîk û azad li ber

çem dihat, bîna min fereh bû, ji min dihat ku ez bi sobayê  
140

avê qut bikim, lê Dicle ye û henek pê re nabin, naçare  
min pêncî Fels dane yekî kelekçî ku xelk bi kirê derbasî wî  
alî dikirin, nizanim çiqasî qutkirina çem dirêj kir, lê bi  
min gelekî dirêj kir, her ku min nêzîkî li rexê dî dikir, pê  
dihesîyam ku bêtir azad dibim û hîn jî min bawer ne dikir  
heta keleka ez tê de xwe li bin guhê kenarê dî xist, ez berî  
herkesî pey bûm, dema lingê min li ser axa kenar bi cih  
bûn ez ji kêfa re qêrîyam û heta ji min hat min bayê  
azadîyê berda herdu pişikên xwe.

\* \* \*

Bi rewşeke xirab ez gihame navçe ya Barzan, solên min  
qetîyayî, por û rîya min dirêj, rûyê min terikî û dest û  
zendên min weke ku birijî bin ji ber tîna roja temmûzê.  
Gelek ji endamên Hîwa tev li hêzên Mele Mistefa bûbûn,  
hinek serbazên Kurd yên di artêşa Iraqê de jî bazda bûn û  
tev li tivingên xwe hatibûn, yek ji wan Sedîq Deştazî bû,  
ez heta sax bim wî ji bîr nakim, wî tivingek Sendoqlî di  
gel sed gulleyî da destê min û got: diyarî te dikim vê  
tivingê, tu dikarî şerê Ezrayîl jî pê bikî!!

Ji nişkê ve, weke xewnekê, weke taveke buharê û şerekî  
newalê, Barzanî xuyabû. Serê xençera wî ya qevdik ji  
diranên fîlekî Keşmîrî di piştana wî de winda bûbû,  
awirên wî bi qasî tûj û xeşimbar bûn, dilovan bûn jî, erd  
di bin lingên wî de dihejîya, roja Kurdistanê rûyê wî  
kiribû mîna straneke Behdînî, şerwelê wî ji rengê axa çiyê  
bû. Xwe siparte şiveke ji dara gwîzê, çend hilm dû ji ci ber

emzika cixareya di devê xwe de berdan û bêyî ku li  
şervanên kombûyî binêre got: we dît çi derew li me bû?  
Weke qeşa ya li ber tavikê sozên Ingilîzan helîyan!! Êdî ji  
bêgavî emê şerê wan bikin, dibe ku em hindik bin, dibe  
ku em bi ser nekevin jî, lê ne mumkine em di bin siya  
dara sitemkarîya wan de çavên xwe bidin ser hev, şêr ji  
birçîna bimre jî berateyan naxwe!!

141

Nûrî Seîd çû, Paçecî hat, ew du rû ne ji yek Dînarî re, du  
tîrin lê kevan yek e, tîravêj jî yek e, îcar em û van çîya û  
tivingên xwe.

Barzanî hinekî rawestîya, şiva xwe ya ji darê gwîzê du sê  
carî li cizme ya xwe da û piştî pêlekê ji ramanê kin got:  
dilê min heye biçim herêma Behdînan, li wir du êl bi hev  
ketine, emê wan li hev bînin, kî bi min re tê!?

Sêsed tiving bi hev re bilind bûn, sê sed zengelok bi hev  
re qêrîyan: em hemî.

Rûyê wî geş bû, çend nefesên kûr li cixareya xwe ya bi  
nêvî bûbû xistin, şiva xwe xiste bin çengê xwe û pêncî  
siwar û peyade ji bo hevaltîya xwe bijartin, ez yek ji wan  
bûm.

Dema em gihan Kanîya Sincê li nêzîkê rûbarê Amêdyê,  
dilê min hat ku ji singa min bipeke, ez hatim û li ber wî  
rawestîyam û min bi hêdîka got: ez benî, destûra min heye  
ez herim bêhnekê pîrka xwe bibînim?

şervanan bi kerb li min nihêrîn weke ku bibêjin: ma niha  
wexta pîrka te bû, lê Barzanî weke ku razên dilên wan nas  
bike got: here kurê min, lê dereng nemîne û tivinga xwe

bi xwe re nebe!!

Amêdyê , evîna yekem, dara tuyê, minareya camîya mezin, xirecira qeyserîyê, Qebhan, kela Aşeb, Gara û Metîn, kolanên teng û biharên lezok! Careke dî ezê çavên xwe bi dîtina warê zarotî û ciwanîya xwe kil bikim.

Roj li ber ava bû, sihên dar û xanîyan yên dirêj bi westabûn li erdê ramedîyabûn, weke ku xwe ji bîr kiribin, min li gelek deveran roja li ber ava dîtîye, lê ne di ciwanîya roja Amêdyê de bû! weke yekî di xew de bimeşe ez hêdî hêdî ber bi mal ve diçûm, derîyê hewşê li piştê vekirî bû, çavên min li pîrka min ketin piştê xwe da bû koka dara Tû yê û li derîyê vekirî dinêrî, gava pêjna min kir bi dengê bi girî pêçayî ban kir: Badîn derbas be.

142

Çivîkên ku berî kêlîkekê bi çivçva xwe hewş dagirtibûn ji nişkê ve bédeng bûn û bi hev re firîyan, bayê ku ji ber baskên wan rabû çîmenên dil hejandin û ez xwarî destê pîrka xwe bûm, du hêsr di çavên kor de biriqîn: kurê min ez te nabînim, lê min zanîbû tê îro bibî mêvanê min, sê caran hevîr ji teştê min firîya , hevîr derewan nake Badîn. Hêdî hêdî tarî dikete erdê, pîrka min serpêhatîyên xwe ji min re rêz kirin:

Mala me li mîrata reş gerîya lawo, çêleka min Kejjê kuştin, nizanim çi bi wan kiribû?! şîrê xwe yê zelal dida, rîxa xwe dikir û bédeng diçêrîya, haya wê ji bayê felekê nebû, lê ji jor de hatin û agir berdan zevîyên me, pez kuştin, zad şewitandin û mal hilweşandin.

Ew ne bes bû birûskeke havînî jî keça meta te ya ku nû ji

tekye ya bamernî hatibû li nav rez şewitand!! Rebenê nizanîbû çî mesele ye, her ku tavan dikire gurmîn û birûskan dikire şîqînî, gazekê çeng dibû û ji tirsan re dikenîya, di nava kenê wê re Izrayîl hat, bi birûskeke zalim re hat û ew ji min sitand.

Ez bêtir li ber çêleka xwe dikevim, gelo wê bi Hitler axa û Çerçel beg çî kiribû!! wey xwedê ocaxên wan kor bike û çêlekên wan bifetisîne û wan bê şîr bihêle.

Min bi xemgînî li bûyer û serpêhatîyên ku li dû min qewimî bûn guhdarî dikir, bîna min teng bû û ez bêdeng girîyam.

Kurê min ez dizanim tu mêvanê çend seetanî, min ji te re ev berbejn hazir kirîye, têxe stûyê xwe wê te biparêze, welîyekî Neqşebendîyan ew nivîsîye.

Min berbejn ji dest pîrka xwe girt û xwarî destê wê bûm, wê jî gote min: Badîn terhikekê ji rezê me bi xwe re bibe, gava şîn hat zanibe mirina min yan jî ya te nêzîk bûye.

Rez ne gelekî dûr bû, min weke wê gotî kir û di tarîya şeveke Amêdyê de berê xwe da Kanîya Sincê cihê ku Barzanî û hevalên xwe lê. Berî ez ji bajêr derkevim,

143

dagerîyam goristanê da ku gora diya xwe ziyaret bikim, lê min ew nedît, ew sax bû min nedît, û di mirinê de jî min nikaribû gora wê nasbikira!!

Ji Kanîya Sincê me berê xwe da Mirîba, çend yekîne ji me cuda bûn û çûne Nêrwe Rêgan û deverin dî, ez bi yekîneya Barzanî re mam.

Êdî payîzê li dergehê xwezayê dixist, di dilê me de jî

teqîna biharê bû, xeber giha me ku general Renton yê ingilîzî yê lepqut bi xwe serektîya hêzên Iraqî û Ingilîzî dike û leşkerekî giran diajo herêma Barzan, bîna cengeke nebûyî dihat. Êdî cenga cihanî rawestîya bû, Hitler xwe kuştibû û Berlîn ketibû destên artêşa sor, li Japonê jî bombeyên atomî ziravê Japonîyan qetandibû, naçare ala spî bilind kiribûn û peymanê teslîmê imze kiribûn.

Dewletên mezin ji stirîyên biçûk re vala bûbûn û hewl didan ku ji laşên xwe yê birîndar hilkişînin.

Rojekê em li dora Barzanî kom bûbûn û wî ji me re rewşa hêzên Iraqî û Ingilîzî şirove dikir, ji dûr tozek xuyabû çavên me tevan bi alî tozê de çûn, di her tozekê de siwarek heye! û bi her siwarekî re xeberek heye, Nizanim kê digot. Di wê tozê de jî siwarek hebû, dema nêzîkî me bû di serî de xwe gihande Barzanî û bi ser guhê wî de xwar bû, ew ji navçeya Biradost dihat.

Barzanî destê xwe avête qevdika xençerê û bi hêrs ban kir: Ulu begê Şêrwanî?! Kengî?

Ew siwar ji ba Xudanê Barzan şêx Ehmed birayê Mele Mistefa dihat, tenê du gotin jê re gotin: vegere Barzan.

Min Barzanî di aramîya wî de dîtibû, min qet bawer ne dikir ku ew wî qasî hêrs dibe, te digot çavên wî wê kêlîkê du xençerin û li kezebekê digerin!! Qelûna xwe ya ji dara Mazî vexist û dûyekî dirêj berda û got:

Ulu beg li Mêrgesor kuştin, ne bese guhên xwe weke qamîşên cinnan şimmakirine, dixwazin dostên me jî bikujin, jiyana me tehl kirine û dixwazin em çaya tehl

vexwin, ji bo çengek şekir mêrxasekî weke Ulu beg  
dikujin!! Erê emê çaya tehl vexwin, lê jiyana tehl!! Na û  
sed carî na, îro şoreş dest pê dike.

Û dest pê kir şoreşa şekir.

\* \* \*

27Gulan 1946 Mehabad

vê êvarê min li nûçeyên radyoya Tewrêzê guhdarî dikir,  
nûçebêj bi Azerîyeke qebe û zivir behsa rûniştina Cefer  
Pêşwarî û nûnerên hikûmeta merkezî û deh xalên Ehmed  
Qewam dikir.

Xuyaye Pêşwarî êdî derpî datîne, ew gihiştîye bawerîyekê  
ku divê peymanê bi Hemeriza re deyne û bi yek carî xwe  
têxe hemêza dewletê!! Lê ne sûcê wî ye, xuyaye kalkê  
min lîstika siyasetê fêmkirîye, wî tim digot: tilîya Mosko  
di her qulê de he ye.

Dibistanan îro dergêhen xwe girtin û me li dibistana xwe  
xatirxwestinek biçûk lidar xist, qutabîyekî dengxweş navê  
wî Ezîz Şahrux çend stran gotin û mihricana belavkirina  
şehadetnameyan dest pê kir, ez û Mujde ya rû xemgîn li  
rex hev bûn, wê her kêlîkekê hêsrên xwe dadimalandin û  
digot: ezê bêrîya te bikim, eger tu karibî rojekê were Şino  
em hev bibînin!!

Sibe berê min li enîya şer e, ezê dersdan û qutabîyan li dû  
xwe bihêlim, dema tivingê hat.

\* \* \*

Hezîran 1946

Nêzîka du heftîyan e ez li enîya şerim, ez deqeyekê vala  
nebûm e ku rojbuhêrên xwe binivîsim, her sibe berî roj

hilê em ji xew radibin çeperan asê dîkin û kozikan ava dîkin, xendekan dikolin û tivingên xwe zeyt dîkin, Xelîl Xoşewî bi xwe alî me dike.

Rêya li jêr Mameşah (çiyayê ku em tê de bi cih bûne) ya ku diçe Seqizê, bûye weke rêya mûrî û gêrikan,

145

kamyonên Îranî yên leşkerî diçin û tîn û em jî bê dilovanî wan gullebaran dîkin, duh pêşmergeyek ji hêla Serheng Mîrahac hat û got: Rezm Ara xwe ji êrîşê re amade dike, hay ji xwe hebin!!

-bila ew û leşkerên xwe hay ji xwe hebin, me gorên wan li vir kolane! bi ken Xelîl Xoşewî bersiva wî da.

Mele Mistefa li Tewrêz e, em jî li hêvîya fermanên leşkerî ne ku êrîşî dijmin bikin û Seqiz û Sine û Kirmanşahê têxin destê xwe, nema tebata me tê, fersend jî ji niha çêtir nînin, artêşa Îranê qels e û taqet tê de nemaye. Lê aaax ku biryar di destê min de bûya, niha ala Komarê li ser bîrê Petrola Kirmanşahê jî li ba dibûn, li ser camîya Darulihсан li Sine jî û li ser her avahîyên li Seqizê.

komareke weke qutîya tûtînê têra qelûnkêşîya me nake.

Min behsa qutîya tûtînê kir, ew roja reş hate bîra min, roja ku Jale tê de qutîya min (ya bavê min, ku navê wî bi tîpin Ermenî li ser hatîye nivîsîn) dizî û dilê min li min vegerand, lê ez bi tûtîna ku di Idarey Duxanîyati Mehabd de mabû xwe diqedînim.

Piştî ku tûtîn barkirin Rûsya, li idarey Duxanîyat hûrikê wê mabûn, xelkê ji xwe re ew civand û hinekan jî ew bi erzanî difiro, min ji yekî (piştî qutîya min çû) kîloyek bi



deh şahîyan kirî, lê tu dibêjî qey ez sergînan dikêşim ne tûtinê.

Rewş êdî zelal dibe, lê gotina (zelal) bi xwe jî zelalkirinê dixwaze, rewş zelal dibe ango rewşa komarê tarî dibe, Demokrat Firqesî û hikûmeta merkezî li hev hatin, hema tu dikarî bibêjî Azerbeycan kete bin eba ya şah Hemeriza. Artêşa sor niha li bakurî çemê Aras e, yek nefer jî di xaka Îranê de nemaye, rast e weke kalkê min digot: Stalîn weke liba nîskê ye, ne serî heye ne qûn. Berî çend mehan me digot êdî dîwarê ku Kurdan piştî xwe sipartîyê nayê herifin, ew dewleta ku ala xwe li ser banê Rayxstagê bilind bike tu kes çavên wê naşkîne!! ew dewleta ku ji bo  
146

bindest û xebatkar û gundî û karkiran ava bûye tu carî milletekî bindest erzan nafiroye, lê va ye ji bo firrek petrol komar hate firotin. Hîn komar di pêçekê de ye tîn ku bixeniqîn.

Em pêşmergeyên li bakurî Seqizê, li hêvîya teqînê ne, artêşa Îranê weke ku ji me re hate gotin xwe ji êrîşeke mezin re amade dike, ez guman dikim ku alîkarî ji Rûsan were xwestin wê xwe nedin ber û cilikê ji bin lingên me bikişînin û me ji qedera me re bihêlin.

Çiyayê Mameşah bêdeng e, lê gupegupa dilê çil û sê pêşmerge yî wî dihejîne, çil û sê tiving û çend topên ku rokêtên wan siya wan derbas nake, lê vîna weke pola, û xwîna ji volkanekê germ tir hêz dide wan, gelo Stalîn ji dil yarmetîya me bikira emê heta ku çûbûna!!?

Divê êvarê em hilkişin jor û tev li Xelîl Xoşewî û hevalên

wî bibin, Mîrhac û hêza xwe jî li rojavayî çîyê amade ne û ne kêmi me bi hêrs û dilgermin.

Işev...li ber vî zinarê lal yê ku min pala xwe dayê, û di bin ronahîya vê hîva dilovan û van stêrikên dev li ken de, ezê bîranînên xwe yên sala par binivîsim, kî dizane dibe ku mirina ku ez li hêvîyê me nêzîk bû ye û êdî berbejna pîrka min nema tesîra wê heye. Ezê binivîsim, min di destpêkê de jî got ku tenê nivîsandin zora mirinê dibe!! Ez bi xwe ji mirinê natirsim û ji pêknehatina hêvîyan jî bêzar û dilteng nabim, ji xwe jiyana li ba min rêzek ji pêknehatina hêvîya ye, lê nizamim çima ewqasî bûyerên jiyana xwe pêwîst û giring dibînim?

Hîva dilovan ya ku ez jê ditirsim hêdî hêdî dadigere, Mehabad bi ronîya xwe ya fedyok dişo, li ber tava wê ya zîvîn rûpelên xwe yên bêdeng û li hêvîya nivîsan dibînim. siya pênuşê û destê min yê rastê hinekî wan tarî dike, lê peyv bi xwe çira ne rûpelan ronî dikan.

Payîza par bû, piştî ku şoreşa şekir dest pê kir em ji Behdînan vegeyîyan û me berê xwe da Akre yê, balafirên  
147

hêzên azmanî yên Birîtanya R.A.F li hêvîya me bûn, Teigermath (cûreyek balafirên Birîtanî sivik û baskên wan duqatî ne) li jor me hêlan dikirin. Em ber bi çemê Zab ve diçûn, me her yekî meşkek nepixand û pê çem qut kir. Dema Barzanî lingê xwe li kevîyê zab yê dî danî, bi awirên xwe yên tûj li ezman nihêrî û got: eger ne ev teyare bûna niha emê li ber sînorên Bexdê bûna!! wellahilezîm hinekî dî hêza me xurttir bûya û ne ev xayinên me bûna

min dê destê Renton yê dî jî qut bikira!!

Me kozik û çeperên xwe li çiyayê Pêris û Akreyê çêkrin û şerekî giran qewimî, zora dijmin tê de çû û gelek çek û sileh ketin destê me, me serbazên alayeke Iraqê dorpêç kirin û tu nema bû em wan mehf bikin lê çend eşîrên Kurdan bi hewara wan hatin, Barzanî gelekî dilteng bû û dihat ku şûtikê li newqa wî gerîyayî biqetîne: ne hesin be, tu tişt hesin nabirre!!

Em hindik bûn û naçare me biryara vekêşanê stand, me meşkên xwe hemî civandin û yeko yeko, her şervanekî meşka xwe qetand.

-êdî veger nema.

Barzanî bi çavin tijî hêsir li me dinêrî û digot:

-derî neman û me lê nexist, kesî destê hevaltîyê dirêjî me nekir, vane birayên me jî destên xwe dixin destên neyar û li me dixin, rê neman, çare nema, emê biçin herêma Mukrîyan, lê ev xak dizane emê vegerin, bi hêz tir û xurt tir emê vegerin.

Bi sedan zarok û jin û pîr û kal li pêş me diçûn, hin peya hin jî li ser qantiran berê wan li erdekî nenas bû, zevîyên xwe, xewnên xwe, xanîyên xwe û hêvîyên xwe li dû xwe hiştin û di wê koça xemgîn de, wî kerwanê aware de, di newalên kûr û birrekên di rengê mirinê de, weke axînan diherikîn.

Dawîya payîzê bû, ji hinan re jî payîza dawî bû li wî xakê efsaneyî.

148

\* \* \*

16Hezîran Mameşah 1946

ez xemgînim, şadim jî. Xemgînim ji ber ku îro xebera mirina lehengê şerê ku berî du rojan qewimî gihîşte me, şadim ji ber ku me zora artêşa Hemeriza bir.

Deh gulleyan bedena Xelîl xoşewî (şehîd kurê şehîdan) qul kirin, ez li rex wî bûm dema ew weke dîwarekî hate xwarê, destê xwe dirêjî zinarekî dûr kirin û got:

Badîn hay ji xwe hebe, teqîn ji wir tê!!

Min jêdera teqînê nas kir û cendekê serbazê Îranî yê li pişt zinar gindirand, xwîna ku ji birînên xelîl diherikî ji kanîyekê gurtir bû, nizamim çawa çend pêşmergeyan ew hilgirtin û dûrxistin.

Li nexweşxaneyê Rûsî li Tewrêzê Barzanî hate serdana wî û her deh birînên wî yên kûr ramûsan, ew dev li ken mir, wê rojê xelkê hemûyan girîyê Barzanî dît:

-tenê mêr dizanin li ser lehengekî mîna xelîl bigirîn!

Barzanî di nav damalandina hêsrên xwe re got.

Xwîn di rehê me pêşmergeyan de dikele, em li hêvîya êrîşa mezinin û çavên me li başûr in, lê biryarên siyasî yên weke qeşa û xûsîyê ji jor de têne xwarê me sar dikin.

Gelo Mujde li Şino çî dike? Min navê wê li ser qundaxa tivinga xwe kolaye, ker ku fersend dikeve min ez qundaxê maç dikim, îro Xorşîdê Mizûrî (pêşmergeyekî bi min re li Mameşa ye) çav li min ket ku ez tivinga xwe radimûsim, hate ber min û li qundaxa tivingê nihêrî:

-ev çî tiving e Badîn?! min Martînî û Manlîşer û Birno

dîtîne, lê Mujde!! tu bi xwedê kî malê ku ye ev tiving?

-malê evîne ye, malê wêrana dil e Xorşîd, malê hêvîyên

pêknehatî û xewnên ku dimînin xewn. min bersiva wî da  
û dûr meşîyam.

149

Xuyaye wê rojên me li nav van zinaran û hîm û latan  
bêhûde herin, ez dê vegerim Mehabad, tiving bê teqîn û  
dil bê evîn zingarî dibin.

20Hezîranê 1946

ya ku em jê ditirsîyan qewimî; duh civîna Haşimof bi  
Pêşewa û Mele Mistefa û Mîrhac û Emerxanê Şikak û  
Mistefa Xoşnaw re bû, ew li konsulgeha Rûsî li Tewrêzê  
li hev civîyan û li şîretên konsulus Haşimof guhdarî kirin,  
weke ku xeber giha me, wî bi tundî berê xwe da bû  
Pêşewa û gotibûyê: sergermîya we bela serê we ye, hûn  
planan ji xwe re datînin û we çavê xwe berdaye êrîşa  
başûr. Hûnê çi bikin ji Kirmanşah û Seqizê?

Dibêjin Pêşewa jî bi tundî lê vegerand û got: we bi  
sedhezaran kes dane kuştin da ku Stalînggrad nekeve dest  
hêzên Almanî, tevaya cîhanê çepik ji we re lêxistin, lê em  
dixwazin perçeyek axa xwe ya bindest vegeerînin hûn  
keleman bo me çê dikin!!

Haşimof hîn bi tundî bersiv da: eger hêzên komarê gavekê  
pêş de biçin, bawer bikin emê destên xwe ji destên we  
bikişînin, hûn dîn bûne û dixwazin herin têkevin nav  
lepên hêzên Ingilîzî. Barzanî rabû ser piyan û got: em  
dikarin xwe biparêzin, û pêşberîya Îranê bikin, tenê hûn  
li himber me ranewestin!!

Haşimof bi ser de rabû û bi hêrs got: hûn Kurd bi  
sergermîyê astengan çareser dikin, hezar sal bo we divên

ku hûn siyaseta navnetewî fam bikin.

Pêşewa bi Rûsîyeke pak bersiva wî da û got: binêre ez ji serbazên dîl yên Rûs di şerê cîhanê yê yekem de fêrî Rûsî bûm, de ka tu ji azadên Kurd dikarî fêrî çî bibî.

Haşimof, weke ku nebihîst, berê xwe da Pêşewa û got: dubare dikim, gavekê tenê hûn pêş de biçin, gazina we ji we be.

150

Barzanî û Pêşewa bi rûyekî tehl û xemgîn li hev nihêrîn û bi wî rûyî ji civîna konsulusê Rûsî derketin, Emerxan di ber xwe de got: ev çî dostên ji qeşayê ne! Ev çî siyaseta e! Dibêjin piştî şêwr û dan û standinê Pêşewa jî nerm bû ye û dibêje: em nikarin qayîşê bi Rûsan re bikişînin, çawa be ew dostên me ne!!!

Dema min ev bûyer bihîst, dilê min sar bû, bawerim gelek ji pêşmergeyan jî sar bûn.

Dostên te qeşa ne

Havîn tê

Germ dibe

Ew dibin av û diherikin

Difûrin

De tê çî bikî sotîyo

Gava hevalên te qeşa bin û

Dilê te neviyê volkanê be!?

ewrin hevalên te

bi bayekî re

hema bi henekên bayekî bakurî re

bela dibin û

ezmanê te sayî dibe  
hevalên te cixare ne  
tûtînin  
bi du hilman re  
tilîyên te dişewitînin  
mûmin hevalên te  
pirîskek wan geş dike  
pîfek wan vedimîrîne  
xewnin hevalên te  
xewnin ji avê

151

ji dû û mijê

ji leylanê

Rûsin hevalên te.

\* \* \*

havîn dibawişke li ser rêyên ku diçin û tên Mehabad,  
zinar disincirin û mejî tên ku mîna Berrûyan biteqin.  
Gelo çiyê çare ya vî dilê westîyayî, li vî çiyayî, li ber van  
zinarên sincirî!?

Ez bêrîya Mujde dikim û nema bawer dikim fermana  
vegerê derkeve, da ku li Mehabad vegerim. Fersend bi  
dest min neket ku ez wê nîşan bikim, belkî xeyal bike ku  
min henekên xwe pê fikir, ji xwe Kerîm jî vê dawîyê  
nema li min dipirsî û min tê derxist ku tesîreke wî ya bi  
hêz li biryarên Mujde heye, Mujde ne tenê wî weke bavekî  
dibîne, bi her awayî pêve hatiye girêdan.

Êdî gundî ji me nefretê dikin, xwarin û vexwarina me,  
êm û alifê qantirên me hemî li ser wane, îro gundîyekî ji

êla Dîbokrî gilîyê xwe bi min kirin û got: ma komar bi serê me ketîye?! Ha!! Mehabadîyan ew qas tûtin firotin, şekir firotin, pere bi ku de çûn? Ha!!em ji derdê cixreyekê dîn dibin, we çû qelûna stalîn tijî tûtin kir, em çaya tehl vedixwin, we çû qend û şekirê Miyanduabê hemî firote Azerîyan!! Salam Cawîd û Cafer Pêşwarî ji me çêtirin!? Ji xwedê gunehê birazê, zulm û sitema axayên me ne bes bû, we li ser temam kir, ka tu bi xwedê kê hûn çî dozê dikin? Ha!!

Min kir û nekir ku ez wî li ber xim ku Komar ya hemî kesên Kurd e min nikarîbû, wî her digot: şer nema de hûn doza rihê me dikin? Ha!! De ji çiyê dakevin û me di halê me de bihêlin, we em talan kirin!!

Gelek gundî weha dibêjin, serokeşîr wan dihêvojin, ew serokeşîrên ku di bin re têkilîyan bi dewleta merkezî re datînin û li dijî komarê dixebitin!!

152

Berî çend rojan, dema Menaf Kerîmî hat û enîya Seqizê ziyaret kir, pêşmergeyan kareke çarmehî spî ji gundîyan standin û biraştin, di tarîya şevê de li ber ronahîya agir em li dora Menaf civîyan û me lê guhdarî kir, wî bi keser digot:

birayewe, ez hatibûm ku plana şer ya nû li yekîneyên we belav bikim, be daxewe her tişt safî bûbû, dostên me yên Rûs nahêlin em bi dewletê re şer bikin, Haşimof axa dibêje: gulleyek biteqe hûn ji xwe re dizanin, em dê piştê ji ber we bikişînin. Pêşewa û giregirên Mehabadê jî di fikra wî de ne. Hewdan û êrîşa li ser dijmin êdî wê



raweste.

Li ber agirê wê şeva ker û lal du hêsir di çavên Menaf de biriqîn û dîsa bi keser got: xeman nexwin, bêguman wê çare werin dîtin!!

Piştî me hestîyên wî karikê biraştî ji goşt rûtkirin, Menaf di guhê min de got: Badîn ji kerema te, du gotinên min bi te re hene!!

Em çûn û di kozikekê de rûniştin, me piştî xwe da tivingên ku xwe bi payebûn sipartine dîwarê kozikê, pêşmergeyan li dûr xwe avêtibûn pişt şikêran. ew bi dengê ku bi zor min dibihîst diaxivî: Badîn te têra xwe pêşmergetî kirîye, tu mirovekî cesûr û dilêrî, lê ji bîr neke tu rewşenbîrekî têra xwe heyî, niha komar muhtacî mejî ye bêtir ji tivingê. Vaye wê kitêbên dibistana seretayî bi Kurdî çap bibin, tu xwedan tecrubeyî di vî warî de, me divê tu alîkarîya me bikî, dibe ku em weşana radyo ya Mehabad jî li ser pêla kin SW amade bikin, sed care ku em ji Rûsan cihazekî xurt ji bo weşanê tika dikin, lê wan guhek kirîye bêjing yek serrad, vaye muhendisekî Ermenî niha li Mehabad e belkî çareyekê bo me bibîne, wê gavê tu dikarî di radyoyê de jî bixebitî û nûçeyan bi Behdînî biweşînî, bila dengê komarê li tevaya kurdistan belav bibe. Te çi got!?

153

Ma min dê çi bigota? Ez jî ji vê pêşmergetîya bê şer dilteng bûme, em li vî çiyayî weke bazên girêdayî ne, nêçîr li ber çavên me ye û bazyar me bernade!! ji xwe tiving di destê min de bê teqîn, bûye darê şivanan ku tenê

pê pez dihajon.

-Ez dê destûra xwe bixwazim û bi te re vegerim. Min ji Menaf re got.

\* \* \*

1Temmûz Mehabad

Berî çend rojan ez vegeîyam Mehabad, dema çavên kalkê min li min ketin, kenîya û got: ka berxikê min te çi ji Kirmanşah anî?! hema te tenekeyek neft bi xwe re anî be!!

154

Min mebesta wî fêm kir û bi xemgînî lê vegerand: eger ne Rûs bûna min dê Kirmanşah hemî bixista paşila xwe!!

Wî careke dî bi ken got: da tu zanibî, dema bixwazî biçî avdestê jî divê berî her tiştî izn û destûra Rûsan bixwazî, bê destûra wan tu nikarî tirran bikî, kero! Ma Haşimof li vir li morîkên diya xwe digere!! Ew şivanê berjewendên dewleta xwe ye, ji min bipirse bê me Ermenîyan çi anî serê xwe ji dû sozên van sozxuran.!!

Pişt re ji nişkê ve kalkê min berê axaftinê guherî û bi lez got: tu dizanî ew Elsa kî bû!?

-Jale bû. Min bersiva wî di cih de da, wî bi Farisî pirsî: ez ku ca mîdonî!(tu ji ku dizanî(?

-li Silêmanîyê min ew nas kir û evîna wê ya xedar dilê min biraşt.

-hey tu ava bin kayê yî Bado! Lê tu dizanî ku ew casûsa Ingilîzan bû jî!

-her tişt ji kesên weke wê tê.

-Hemîd Mazocî -serokê polîsên leşkerî- berî demekê hate ba min û pirsas wê kir, li gor agahîyên wî, konsulxaneyê Ingilîzan ew hinartibûn Mehabad û wê di rêya navlingên xwe re rewşa komarê bi Mors ji wan re dişand, Ingilîzan jî agahîyên wê ji Humayonî û Rezm Ara re peyapey dişandin, lê netirse cewrikê min, min qala te nekir, û Elsa, mebesta min Jale, revîya berî ku wê bigrin. Niha ez li odeya xwe me, min tirîyê daşa Mecîd li ber pencerêyê danîye û bi hêvîya ku hinekî hênik bibe mame. Tirî meyweyekî weke sihrê ye, dibe mey, dibe mewîj û dibe dimis, dibe bastêq û benî, dibe her tişt. ez tirî weke xwe dibînim, di navbera min û tirî de têkilîyeke giyanî heye, tenê cudayîya min û vî meyweyê havînî ew e ku gelek sal ji min re divên da ku ez bistewim, lê ew di mehekê de!!

155

Vî tirî yî rezê me anî bîra min, pîrka min ez havînan bi xwe re dibirim rezê li binanîya çiyayê Metîn veketî, sebeteke biçûk diavête milê min û em li nav rez digerîyan:

-kuro Badîn hay ji tûpişkan bike, germe !tûpişk har dibin û xwe li goşîyan digrin, berî tu goşî biçinî qenc seh bike!! pîrka min bi rê de digote min.

min di rez de bi ya wê fikir, lê di rezê jiyana min de tûpişk li min der bûn û bi min vedan bêyî ku ez libek tirî bixum.

Kêfa min bêtir ji tirîyê spî û danedirêj re dihat, ew weke tilîyên keçikên çardasalî nazik û zelal bû û goşîyên wî

mezin bûn, şêranîya wî jî nayê pesindan. Tirîyê reş yê ku Cihû û Kildanan bi baran ji me dikirîn, qet min jê hez nedikir, çermê wî qalind û tama wî bi min ne xweş bû, lê niha ez tê digihim ku mey a herî xweş ji wî tirîyê reş peyda dibe.

Keça meta min jî gelek caran bi me re dihate rez, min goşîyê herî stewîyayî jê re diçinî û bi fedî dida destê wê, wê hinekî pif goşîyê tozgirtî dikir û dibû qirçe qirça daneyan di nav diranên wê yên spî de.

Ew çi mirov bû yê ku razên tirî eşkera kirin û tê ghişt ew dibe Mey?! ne mumkine, yan xwedê yan jî şeytan ev zanebûn ji mirovan re daxistîye erdê!!

Dema ez bi Barzanî re çûme Behdînan, min şaxek ji rez bi xwe re anî û li hewşa xwe ya li Mehabad çand li ser daxwaza pîrka xwe, min berê jî ev nivîsîye, mebesta wê ew bû ku Amêdyê ji bîra min neçe, lê her ku ez vî şaxî di bêdengî û tenêtîya wî de dibînim ji bilî mirina min nayê bîra min, pîrka min got: eger şîn bê mirina min nêzîk dibe !! nizamim wê kengî şîn bê ev şax!?

Roj bi roj kela hestên xelkê sar dibe, êdî rizgarkirina başûr jî, ji holê rabû, xelk wê bi çi mijûl bibin!! ez bala xwe didimê ku piranîya xelkê li radyoya Tehranê û ya 156

BBC guhdarî dikin, ya Mehabad bilûra ber guhê gayekî ye!! xelk bawer nakin ku radyo bi Kurdî xeber dide, ne tenê weha, pir li xweşa wan jî naçe. Ew di wê bawerîyê de ne ku zimanê Kurdî tenê yê axaftin û kirîn û firotinê ye. Ev şar bê Mujde weke wî şaxê hişk û rût e, xemgîn e,

sebra min lê nayê, xwezî min bi ya Menaf nekiribûya û ez  
ji çiyê daneketibûma, nizanim wê çawa ev du meh bibûrin  
bê evîn û işqbazî!?

Keleşêrên Mehabad dest bi bankirina xwe dikin, êdî dema  
xewna ye.

\* \* \*

Çira sêyem

Li ber bayê bakur dîlaneke dîn dike

Ne vedimire ne jî geş dibe

Mîna hêsireke zindaniyekê ye ku naxawze kes wî di halê  
girî de bibîne.

157

4Temmûz

Îro nameyek ji Kerîm ji min re hat, tê de nivîsîye:

Badîn

Ez li Şino me, xefkan ji bayên dîn re vedidim, ez  
nêçîrvanê bayê me, weke tu dizanî, lê heta niha bayê kurr  
xwe bêcîrr dike û nayê rayê, ew bayekê har e, bi hêsanî

158

nayê girtin, lê rojek wê bê, ew jî weke keroşkeke çiyayî  
wê têkeve xefkê!!

Em û Azerîyan ne li hevin, tu dizanî kîn û hevrikî yên me  
yên kevin bi hev re hene, ew jî weke ba ne, lê nêzîk tê  
bibihîzî ku ketine xefkên Şikakan û Herkîyan, em ava  
serê wan dikelînin, piraniya gundên me yên derdora Xoy  
û Ormîye ji axayan standine û li Azerîyan belav dikin!!  
Eger li gundiyên Kurdan belav bikirina dîsa ne xem bû,  
ez ne ew qasî alîgirên xan û axa me. Ne tenê weha jî lê

Xoy û Ormîye ji welatê xwe dihesibînin, tu dizanîn van bajaran nakokî di navbera me û wan de çêkirîye! Mixabin di vê pirsê de Rûs alîgirê wanin, guhê xwe ji daxwazên me re girtine.

Mehabad çawa ye?! Kar û bar çawa dimeşin?! Min bihîst ku we dev ji plana rizgarkirina başûr berdaye?! Çima!? Eger xaka me ye xwîn heye ku em ji bo wê birêjin, xwîna me ji rehên me ye, û tu pereyên Rûsan lê naçin.

Kerîm gelekî ji êla xwe hez dike, di nameya wî de ev yek ne diyare, lê di civatên min û wî yên taybet de, tim digot: eger rojekê Şikak komarekê li Şino û Ormîye ava bikin, ez dev ji Mehabad berdidim!

Kerîm di nameya xwe de behsa Mujde nake, gelo çima? Mujde jî ew qasî li min napirse, tişteki ne asayî dibe. ditirsim tişteki weha di serê Emerxan de hebe, bala xwe didimê ne gelekî riht e li vir, di gel ku ew kurdperwerekî xwîngerm e lê êla xwe bi komarê tevî nade. Ditirsim kerîm jî li pey wî biçe!!

Min bêrîya meyê kirîye, lê kalkê min van rojan li min napirse nizanim çi bela wî ye? Ezê bîsteke dî herim ba wî.

\* \* \*

Mala şêr ji hestîyan xalî nabe!! Ez vê êvarê li ba kalkê xwe bûm, wî ji bin kulîna xwe şûşeyek araqî derxist û vekir, hinek qeşa peyda kiribû, bi xemgînî gote min: here bila ew kerê Agop jî were, sebra min bê wî nayê, ku

159  
nebe ez nizanim vexwim, û straneke Ermenî di ber xwe de got.

Me her sêyan li ber ronîyeke melûl, dest bi vexwarinê kir,  
weke her carê zimanê kalkê min weke hespekî ji tewla dev  
derket û dest bi sixêfan kir:

Ev segbavên Rûs Vodka li me kirin efyon, ez Pêşewa  
bûma min dê li dewsa wê tûtînê Vodka anîbûya, hey wan  
tank û top nedane wî, bila çapxane û radyo jî di diya  
Stalîn ve bûna, wî ker kurê keran Haşimof jî, ticareta  
Vodka hemî xistîye destê xwe, berê me bi Tumenekî bîst  
şûşe dikirîn, niha em bi tumenekî yekê jî nikarin peyda  
bikin!!

Min bi ken gotê: kalo niha tenê ev sûc û gunehên  
Haşimofin?! Awirek tûj li min veda û got: mêşa kerê! ez tê  
digihm tu çê li çi dikî, min ev por ne li ber tavikê spî  
kirîye, ew siyaseta xwe çawa dimeşîne, ne karê min e, ez  
li vodka digrîm ne li Seqizê yan li Xoy, bila bajarên  
dunyayê hemû yên we bin, min û vî kerî ji Vodka bêpar  
nehêlin, bila Mosko jî gundekî komara te be, hey xwelî li  
ser. Ê qedeha xwe weke her cara ku hêrs dibû kire yek  
qurt.

Agopê reben jî, bi her gotineke kalkê min re serê xwe  
dihejand, hêdî hêdî rûyê wî sor dibû û çavên wî dihatin  
ku derkevin, kalkê min nihêrî ku Agop tenê vedixwe û  
serê xwe dihejîne, qedeha wî bi zirzî jê stand û got:  
ma ez Incîlê dixwînim tu serê xwe dihejînî?! Hey mêrê  
kerê! ka ne ya te ye ma kadîn jî ne ya te ye?! te tu jehr ji  
me re nehişt!!

Agop jî gazinên peydanebûna Vodka dikir, min heta wê  
demê ne dizanî ew qas Vodka tê vexwarin, gelo kî ne yên

vedixwin !! di nav dost û hevalên min de kesî meyxur  
nîne, lê êvaran li ber dengê awazin xemgîn bîna vexwarinê  
li kolanan digere!!

160

Kalkê min hîn di hêrsa xwe de bû, berê xwe da rebenê  
Agop û bi sikura wî girt: Agop!! sê roj molet bi te re hene,  
te Vodka peyda kir, tu bavê minî, te nekîr, ez dê herdu  
gunên te biteqînim, ji xwe divê min ji mêj ew biteqandana,  
ma xemla nav lingên te ne? tu karê te bi wan naqede,  
mêrê min!! Agopê girover û sor û kurr bûyî rabû ser piyan  
û wek ku padşahê be, destekî xwe bilind kir û bi  
Farisîyeke rût got: ger sebir kunî, zi xûre helwa sazem!!  
ango eger tu sebrê bikî ez dê ji qorixê dimsê çê bikim, lê  
kalkê min dîsa bezîya sikura wî û bi Farisî lê vegerand:  
ez xûre helwa nemîxam, ez engûr şerab bisaz eger  
mîtevanî!

Min ji xwe re li pevçûna wan her du pîrên Ermenî dinêrî û  
dikenîyam, kalkê min bala xwe da min û got: û tu nevîyê  
hirçê!! destî ez dûr ber ateş darî.

Ez hê jî dikenîyam, lê min kenê xwe birrî û jê re got:  
kalo tu bi xwedê kî, bêje min, çima ku Ermenî serxweş  
dibin bi Farisî diaxivin!?

Dîsa hêrs bû û got: çavê te lê ye ez bi Tirkî biaxivim, hey  
kerzade!!

Agop weke fîlosofêkî bi aramî got: yekemîn kesê ku mey  
afirandî Faris bû, û di dîroka me de ye ku Ermen ji  
Farisan fêrî sazkirina meyê bûne, qiralê Ermenan yê  
navdar Tîgranê yekem, her havîn êrîş dianî welatê Îranê û



barê hezar deveyî tirî talan dikir, ji wê rojê de dema Ermenî serxweş dibin bi Farisî diaxivin, te fam kir!?

Hinekî din xwe nepixand, dema ku dît em lê guhdarî dikin berdewam kir: Badîn qey te bala xwe nedabûyê, kalkê te her carê bi zimanekî diaxive! axaftina wî hal û rewşa wî dide xuyakirin, eger bi Rûsî axivî zanibe ew kêfxweş e, eger bi Ermenî axivî ew xemgîn e, û eger bi Kurdî axivî xweş zanibe ku ew engirîye û jê bitirse.

Min bi ken pirsî: û eger bi Tirkî axivî? Agop hêrs bû û got: wê demê bawer bike ku gur e, nema Ermenî ye!!

161

Kalkê min kenekî dîn kir û got: vî Agopî ev ilim di kitêba nav lingê diya xwe de xwendîye, lê Agop ev hemî te xelas nake, molet sê rojin û sebra tu dixwazî jî bi min re nîne, eger sebir hatibûya kirîn min dê ji Kurdan kirîbûya!

-çima ji Kurdan? min bi ciddiyet ji kalkê xwe pirsî, wî bi dagirtina qedehê dî re bersiva min da: ji ber ku Kurd sed darî dixwin pişt re tê bîra wan bibêjin: ax.

Kalkê min di serxweşîya xwe de bêtir bi kûrayî bûyeran şirove dike, min fikir dikir ku haya wî ji tu tiştî nîne, lê ku serxweş dibû, te digot ew siyasetmedarekî ku salên xwe di partîyan de bûrandine, di serxweşîya Îşev de jî qala Emerxanê Şikak kir, û got: ma tu dizanî ku têkilîyên vî camêrî bi Emerîkanan re hene? tu dizanî mehek tê naçe wê dev ji komarê û Pêşewa berde? Elsa, mebesta min Jale, got di navbera Emerxan û sefîê Emerîkî de mektûb diçin û tîn! ew li eşîra xwe digrî, ne li komara we!!

Ew mirovekî bûyerdîtî ye, bîna wêranê ji qonaxa mehekê

dighêje pozê wî, ne weke te, tu ji pozê xwe dûrtir nabînî.  
Hinekî bêdeng ma, pişt re weke ku tişteki girîngtir were  
bîra wî got: ha, ji xwe min behsa Heme Reşîdê Baneyî  
nekir.

-Bela wî çi ye? min pirsî.

-Bela wî bela her serokeşîrekî ye, kesekî di ser xwe re  
nabîne, bedena wî di bin ebaya komara te de dixure, ew  
Heme Reşîdê Baneyî ye kundirê min, wî jî hikûmeteke  
entîke ji xwe re li Bane û Seqizê li hev anî bû, lê Mehmûd  
axa yê Merîwanî ew di Iraqê re derxist, têkilîya wî bi  
Ingilîzan re diyar e, bawer bike ew niha di xwenên xwe de  
padşahê Birîtanya ye. Tu dizanî kurê min ku komar bi  
hişkeberê ava bûye!?

-çawa?

-yanî kevir û kelpîçên dîwarên wê bê herî ne, wê zû ji ber  
hev biçin weke çawa zû ava bû.

162

Pişt re devê xwe yê serxweş nezîkî guhê min kir û got:  
Elsa li wî dipirsî, eger ez ne şaş bim wan bi dizî hev  
didîtin!! erê, Sultanê dibêje, ne ez: rojekê Elsa bi lez çû  
Seqizê û heme Reşîd li wêrê dît!!

Hêdî hêdî serê min jî giran dibû û odeya kalkê min li ber  
çavê min dizîvirî.

Dengê sîsirkan tarî ya Mehabad diqelaşt, zora dengê  
keleşêran dibir, ezmanê sayî yê bi stêrikan xemilî jî weke  
dayikekê ew şar û gundên wî hembêz kirine, ez mest û  
serxweş li odeya xwe ya bêdeng vegeşîyam û min kalkê  
xwe û Agop di serxweşîya wan û axaftina wan ya bi farisî

de hiştin.

\* \* \*

10Çirîya yekem 1945

baran bû, em li Kêle Şîn kom bûbûn û êdî me bi dil xatir ji xaka xwe dixwest, pîr û kal û jin û zarok rêzeke weke ya mûrîyan di xaçîrêkên wan çîyan de çêkiribûn, hemîyan li rojava dinêrîn, li wan gundên xwe yên wêran û nedihatî dîtî dinêrîn. Barzanî li ser hespa xwe ya boz li karwanê xelkê dinêrî û bi dengê girînî digot: em îşev derbasî wî alî sînor dibin.

Du hêsrên xwe amade dikirin ku ji çavên wî werin xwarê, lê ne diherikîn, weke ku wî ferman dabe wan ku rawestin, bi tehlîyeke bê sînor got: ne Ingilîzan, ne jî Iraqîyan em şikandin, lê van dehşîkên Kurd yên ku divabû piştgirên me bin.

Û zixteke tûj li kêleka hespa xwe da. Balafirên Iraqî û Ingilîzî li ezmanê bi ewran nuxamtî hêlan dikirin, weke hinek mirîşkan kiş bikin. birçî û tazî, westîyayî em ketin vê axa ku tevna komarekê tê de dihate ristîn.

Rastî jî hêzên Iraq û Ingilîzan zora me nebirin, ne bes weha, hindik mabû em general Renton yê lepçû bi xwe jî

163

êşîr bikin, lê bazda û toza kerîyek hesp bi xwe xist. Me gelek narincok û tivingên Brên yên giran û sivik û top û fişek ji dijmin bi dest xistin. Li binanîya çiyayê Pêris jî me alaya çaremîn ya Iraqî xistibû kemînê û sê roj û sê şevan dorpêçkirî man, tu nema bû ku ew teslîm bibe, ez û bîst şervanan bi Barzanî re bûn, ew bi kêf bû û digot: hêza

Hemed Emîn Mîrxan û Ezîz axa li başûr û rojavayê enîya Akreyê ne, weke mûçingê wê vî alayî ber bi me de biajon, hêzek li gundê Gerbêş jî heye, ne mumkine ev alayî ji kemînê bifilite. Emîn bin ku ev hêz teslîm bibe taqeta artêşa Iraqê û şer namîne!

Roja çaran Sûrçî û Zêbarîyan azoqe di tarîya şevê de gihandin leşkerên alayê, me nizanîbû ku ew wê xwe bi çend Dînarên gemarî bifiroşin. Em ji bêgavî vekîşiyar û me xwe li birrekên çiyayê Pêris girt, hîn me xwe bi cih nekiribû û em negihîştibûn ku çeper û kozikên asê çêbikin, êrîşî me kirin, gelek ji Sûrçî û Zêbarî û Şerfanî û Doskî û êlên Berwarê Bala di nav wan de hebûn. Bîst û pênc teyreyên R.A.F û panzdeh topên çiyayî yê giran jî alîkarê wê hêza ku êrîşî me dikirin bûn. Bi şev me çemê Zab bi kelekan qut ki, û weke min berê jî nivîsîye Barzanî emir kir û bi xemgînî got: kelekan bişewitînin, êdî veger nema. Em li çiyayê Şêrîn li wî alî Zab rawestîyan û me bêhnek stand. Li jêr lingê me navçeya Barzan weke xewneke xweş xuya dikir, dilê Barzanî bi ser malbat û gundîyan ve bû, kerîyên pezkovîyan bi aramî di berbanga wî çiyayê bilind de diçêrîyan, Barzanî awirek li wan kerîyan veda û got: eger dehşik di nava van pezkovîyan de jî hebûna, wê qirr bibûna, û yek ji wan li ser rûyê erdê nedima.!!

Li Kanî Reş, Barzanî li hêvîya birayê xwe Xudanê Barzan û gundîyan bû, em bûbûn du sed şervan, ew li ser agir bû û bi wan çavên xwe yê awir tûj çavnêrîya koçê dikir. Heta kesê dawî sînor derbas kir, nû Barzanî nefeseke dirêj stand û got: îcar em.

û em derbasî wî alî sînor bûn.

şervan li deverên cuda cuda hatin bi cih kirin, Barzanî û çend hezar şervan li gundê Mîrawa li navçeya Serdeşt bi cih bûn. Heta mehekê em mêvanên gund bûn. Barzanî heftîyê carekê diçû Mehabad û dihat. Rojekê piştî ji ziyareteke xwe vegerîya, ez dawetî cem xwe kirim û gote min: divê tu biçî Mehabad!!

min Sendoqlî ya Sedîq Deştazî lê vegerand û got: rojek wê bê, ez dê careke dî ji te bistînim, niha berê min li Mehabad e, dibêjin mamoste ji dibistaneke bajêr re lazimin. Ê ez bûme mamoste yê dibistana Gelawêj.

\* \* \*

14Temmûz 1946 Mehabad

deh rojin ne ez bîranînên xwe dinivîsim, ne jî helbest li derîyê dil didin, min digot Mujde dûrî min biçe ez dê rojê çend helbestan binivîsim, lê diyare ku jivana wê bêtir kanîya helbestê di hindirê min de diteqîne. Ev deh rojin ez û Menaf û Hejar û Hêmin ji çapxaneya kurdistan dernakevin, weke ku em di çilexaneyekê de ne, kovar û rojname gelek dertên, lê yek berhema min jî tê de nayê weşandin, ez bi zarê Behdînî dinivîsim, belavkirin û nebelavkirina wan weke hev e.

pirtûkên dibistana seretayî ji çapê re amade ne, hin pirtûk ji bo me ji Silêmanîyê jî hatine, em faydeyê ji wan jî dibînin. Divê li gor projeya ku Menaf danî ye, pirtûk dawîya vê mehê çap bibin. Lê pirsaradyo çareser nebû, Rûsan cihazê xurt nedane komarê, û ew muhendisê

Ermenî jî nema xuyabû, çavên wî li pera bû, û dema jê re hate gotin ku ew pere yên tu hêvî dikî nînin, bû xwê û helîya. Kalkê min ev bûyer bihîst û kenîya, weke her carê qerfên xwe kirin û got: kero! komar ne wê bi radyo li ser lingê xwe bimîne, ev fikrên Rûsa ne, lê ew bi sertewandina serok êlên we ji ala we re xurt dibe, here  
165

bêje wan: ji radyoyên Hitler xurttir nebûn û we dawîya wî dît!!

Îşev ez ji şevbuhêrka li mala Hejar li nêzîkî camîya Rustem Beg, vegeyîyam, cara yekemîn e ez ne serxweş ji şevbuhêrkekê vedigerim, ew bi xwe meyê vedixwe, lê ji tirsê civakê û çûn û hatina xelkê ya bê destûr ditirse, hêmin jî wa ye.

Hejar gelekî bi dilfirehî bi mazûvaniya me rabû. Piştî vexwarina çayê di piyalên tenik û newqzirav de, şîv anî, şîva wî cûreyek xwarine jê re dibêjin Mizrawîlke, ew ji pîvaz û hêkan pêk tê, hinek ard jî li nav dixin û hemî bi hev re di nava rûn de sor dikin, dawî hinek simmaqa tirş jî bi ser de werdikin, ew gelekî bi tam û xweş bû. dema Hejar sênîya wê xwarina xweş li ber me danî, kenîya û got: eger buhar bûya min dê Gêlaxe bo we çêkiribûya. Hêmin Mizrawîlke bîn kir û bi ken vegeand: xwedê kir ne buhar e Hejar!!

Dema meyweyan hat, havîne ji xwe meywe weke memikên keçikan di havînê de distewin û tijî av dibin, Hejar şebeş, hejîr, tirî, talik, û zerdelo li ser sênîyan rêz kirin û li ber me danîn.

şevbuhêrka me gelekî xweş bû, siyaset, edeb, pêşmergetî,  
paşeroja komarê, nakokîyên êl û eşîran, û behsa germîya  
temmûzê mijarên axaftinên me bûn.

Hêmin yek caran ji me re qala jiyana xwe ya li gundê  
Şîlanabad û behsa çandinî ya ku pê radibû dikir û mîna  
gundîyekî zîrek şêweyên çandinîya zebeş û tirî û cûreyên  
meyweyan dikir.

Min dît ku fersendeke qenc e ez pirsaxwe ya ku xewê ji  
çavên min direvîne, jê bikim

-Hêmin can wa diyar e tu ji dar û beran fehm dikî?

-belê qurban, çi heye!!

166

-min şaxek ji rezê me yê li Amêdyê bi xwe re anî bû û li  
hewşa xwe çandibû, ev bûye bêtirî neh mehan ku ew hîn  
kesk nebûye û...

-te qelem kir!?

-na bi xwedê!

-ev e sebeb, axa Amêdyê û ya Mehabadê ne weke hevin.

Hejar kenîya û got: bo çi ne weke hevin?! Herdu jî

Kurdistanin û xwîna mêran bi ser herduyan de herikîye.

Hêmin û Menaf kenîyan, lê ez kûr fikirîm û min di dilê

xwe de got: ne dûr e axa Mehabad li min jî neyê û evîna

min û omîdên min jî nebişkivin. Pişt re min xwest berê

axaftinê biguherim bi alîyekî dî ve û ez ketim behsa edeb  
û nivîsandinê.

Min ji wan re behsa Cizîrî û Xanî û Birîvkanî û Siyahpoş

kir, weke ku ez navên cinnan hildidim, bi devin ji hev li

min dinêrîn û guhdarî dikirin, Hejar got: min navên van

kesan nebihîstîye, be daxewe em Kurd di giravin ji hev dûr de dijîn, me dengê hev nebihîstîye, ez bawerim Kurdên dî jî hayê wan ji Wefayî û Salim û Nalî nîne. Hêmin bi keser got: kulîlk bi hilbûna ba re û ger û seyrana heng û perwaneyan re dibin meywe, mixabin kulîlkên me ne ba û ne jî heng û perwane ew ziyaret nekirine. Menafê ku heta wê gavê bi qeşartina çend hejîran mijûl bû, xwe avête gola axaftinê û got: sebir bikin, bîna xwe fireh bikin, em hîn di destpêkê de ne, inşallah di salên paşerojê de, em dê li her helbestvanekî Kurd bigerin û toza salan ji ser dîwanên wî hilînin û hemî berhemana bi hemî zaravayan çap bikin. û her yekî hejîreke qeşartî li ber me danî.

şev êdî dereng dibû, ji ezmanê ku di hewşa mala Hejar de xuyabû, stêrikan jî li hêvîyên me guhdarî dikir.

Menaf gelekî nefsa biçûk e, me tê dervedixist ku ew reîs e )wezîr e) wisa bi rihetî û dostanî diaxivî, te digot ew ne di kabîneya hikûmeta komarê de ye, wî hin gazinên xwe

167  
kirin û got: derdê me giran e, ev serokên êl û eşîran bawerî bi wan nabe, tenê berjewendîyên wan di serê wan de digerin, haya wan ji xebata netewî nîne. Xwezî Pêşewa rê nedabûya wan!! Demokrat Firqesî ji me zana tir derketin gava ew feodal ji xwe bi dûr xistin. Lê Hêmin ne di fikra wî de bû got: bêyî wan nabe, ew bingeha civaka Kurdî ne, bi iqtidarî û hêz di destê wan de ye, eger em dilê wan bihêlin, yekî tenê ji êla wan di komarê de namîne, civaka Kurdî ev e, xwedê weha kirîye, lê divê em bi zanebûn bi



wan re bidin û bistînin. Hejar bi kenekî sivik bersiva wî da  
û got: te ya rast divê Hêmin!! Divê em rihê wan bistînin.  
Û em her çar kenîyan.

Di nav axaftina me de behsa Xefûr Mehmûdyan jî hate  
kirin, min bala xwe dayê ku ew bi kuştina wî re ne, di wê  
bawerîyê de ne ku ew rastî casûsê Ingilîz û hikûmeta  
Hemeriza şah bû, li wir ez hinekî hêrs bûm û min got:  
başê ew casûs bû, çima ne hate mehkeme kirin? Çima bi  
wî rengê hovane ew kuştin? Eger gunehkar bû divabû gel  
jî di wê bawerîyê de bûya, ne ku ji pişt ve lê bidin, ev kar  
ne layiqî komareke demoqrat bû ku Pêşewayê wê bi xwe  
qazî ye û huqûqan nas dike!!

Hêmin serê xwe hejand û got: Badîn rast dibêje, şêweyê  
kuştina wî ne di cih de bû, mehkeme pêwist bû.

Pişt re xuyabû ku ew axaftin ne li gor dilê Menaf e, me  
berê axaftinê guhert û gelekî pesnê Rûs hate kirin, min  
bawerîyên xwe ne anîn ziman, ez ditirsîyam ku wan ne  
rihet bikim û şevbuhêrkê li hev bixim, min gotinên xwe bi  
kirasekî ji henekan pêça û got: qencîya Rûsan ji Vodka  
wan xuyaye!!

Ji camîya Rustem Beg dengê azana sibê hat. Em êdî têra  
xwe axivî bûn û peyv di tûrikên me de nema bûn.

\* \* \*

168

Baxçeyê Qazî bihuşteke e her cûre darên bilind û mezin tê  
de hene , tu dibêjî ew konekî koçeran yê herî mezin e û li  
rex Sablax vegirtine. di van rojên dojhên de keç û xort û  
pîr û ciwan berê xwe didin vî baxçeyî û di siya darên wî

de civatan digerînin, pir kes tîn li wê derê navroja xwe jî dixun, goşt dibrêjin û dûyê cixareyên wan tev li dûyê komira vêketî dibe. Govandin biçûk jî yek caran tîne gerandin û dengê def û tar û tembûran weke pêlên Sablaxê diherike.

Hin kes tîn xewa xwe ya piştî nîvro li ber bayê hênîk û xiştexiştî çuqlîyên daran û xuşexcuşa pêlên nermik yên Sablaxê dikin, min bi xwe çend caran xewa xwe li wir kir, lê Pêşî û kurmikan nedihîştin ez têr xew bibim. Li wî baxçeyî min û Mujde me gelek seyran kirin, di derên xewle de û di talda daran de me gelek maç vê buhara buhurî ji hev dizîn (xwezî ew niha li Mehabad bûya, ez dûrîya wê hew tehmûl dikim.)

Duh êvarî dema ez çûme baxçe, çavên min li Emîral axa ketin, komik bi komik digerîya û av ji wan pars dikir, dilê xelkê bi halê wî dişewitî û ava vexwarina xwe rûdikirin satila wî, ew jî her ku satila wî tijî dibû, diçû bi ser Sablax de xwar dibû û av rûdikirê.

Dema çav li min ket ez tenê dimeşim, hate pêşîya min û got: mamoste can!! kanî baca xwe bide!

-baca çi Emîral axa?

-av...te ji bîr kirîye ez dê Sablax bikim deryayeke mezin!?

-ne tu dibînî, av li ba min nîne!!

-hêsrî, birjîne hêsrî , bû dereng, divê berî zivstanê em xuşîna pêlên derya bibihîzin, kilîtên demê di destên yekî xwedê nenas de ne.

Ez her dem Emîral axa dibînim, diheyirim û li ciddiyeta wî ecêb dimînim! Rewşa wî di navbera dînbûn û

aqilmendîyeke pirr mezin de ye. Pirsava avê û derya qet nedihate bala min, lê ku min ev dîn dît, gelekî vê yekê 169

mejîyê min li hev xist, ez her û her ji xwe û ji hogir û nas û dostên xwe dipirsim welatê Kurdan li kenarê deryayekî bûya, wê dîroka Kurdan çawa bizîvirîya!!?

Min duh bersiva rast bihîst.

Emîral axa piştî çend satil av rûkirin çem, berê xwe da min û got: mamoste! Ji bilî te kes li min guhdarî nake, çend dostên min çêbûn lê zû ji min qetîyan û pişta xwe dane min, hin çûn dirûna genim û ceh, hin çûn goran bikolin û hin jî li Mehabad man, li hêvîya wêranin mezinin ku mîna kundan êdî li ser kavilan bixûnin!

De were da îşev razên dilê xwe weke tizbîya dewrêşekî dîn ji te re biqetînim, dane dane lê binêre, binêre çi durr û gewherin, çi yaqût û mircanin!!

Min jî dixwest ez wî ji nêzîk bibînim û lê guhdarî bikim, dibêjin nîvê rastîyê li cem dîname! Min da pey wî û em meşîyan.

Êdî tarî dibawîşkî, û mehabad di reşahîya şeveke bêdeng de digevizî. min ne dixwest kes min bi Emîral Axa re bibîne, xelk baqil û dînekî bi hev re qebûl nakin. mala wî di dawîya kolana Pehlewî de bû, dîwarên hewşa wî hemî şil bûn û te digot qey gemîyek di nêva behrê de ye hewşa wî. derîyê nîvvekirî dehf da û ez li dû wî ketim hewşê, bîna pêlan û kenarê behreke mezin ji hewşa wî ya tarî dihat. Em derbasî ode ya wî ya biçûk bûn û weke ez têkevim xewnekê.

Dîwarên odeya wî hemî bi heywanên behrê xemilandîbûn,  
wêneyên gemîyan û kenarên behran û pêlên bilind. hemî  
doşek û palgeh û xalî yên di wê odeyê de bi rengê şîn bûn,  
heta rengê agirê çira wî ya melûl jî şîn bû!!

Dema ku ez li ser kulav rûniştim xêrhatin bi min kir û  
qutîya xwe dirêjî min kir: cigareyekê bikêşe mamoste, ez  
dizanim tûtina te hatîye dizîn!!

170

Weke ku ez li hêvîya vê gotinê bim, min serê xwe hejand  
û qutîya wî vekir, lê çî binêrim!! Qutîyek tijî av, aveke şîn  
ku ne dihişt binê qutîyê ji min ve xuyabibe!!

Min bi devekî ji hev li Emîral axa seh kir, wî mebesta min  
fam kir û bi ken got: kî dikare cigareyan ji avê bipêçe!! Û  
kî dikare pêlan bike tûtin û bikêşe!!

Devê min bêtir ji hev vebû û min qutî hîn ji destê xwe  
dananîbû Emîral axa hate ber min û ew ji min stand û bi  
dengekî nola girî got:

Ne tûtin dibe av, ne jî av dibe tûtin Badîn!

Kêlîkeke dirêj ji bêbêdengîyê kete navbera me, min li  
dîwarên şil û bi heywanên behrê xemilandî dinêrî, wî jî li  
ava ku ji nav tilîyên min diherikî dinêrî.

-navê min Barîn e, weke navê te ye, lê tîpek tenê me ji hev  
cuda dike. Ez Barînê Hewran axa yê Mehabadî me, berî  
çil û şeş salan li rexê rojhilat yê Sablax hatime rûyê vê  
dunyayê, dibêjin dema ez ji dayik bûm di rengê masîyekî  
de bûm û debara min bê av nedibû, di teşteke mezin de  
xwedî bûme, binêre! Û Emîral axa kirasê xwe bilind kir û  
perin weke perên masîyan ku di kêlekên wî de xuya

dikirin şanî min kirin.

Roja ku ez ji dayik bûm, falnaseke Azerî ji dayika min re gotibû: ev kurik wê di nava avê de bimire!! ji wê demê de dayika min ez dûrî avê dikirim, ne dihişt ez nêzîkî çeman bibim, bîra di nîva hewşa me de tijî ax kirin û heta desmêja xwe bi axa sor ya koka Xezayî digirtin, heta temenê deh salî ez weha dûrî avê dijîm, lê dimirim û roj bi roj jar û zeîf dibûm, heta hekîmê Firencî yê ku li Mehabadê çend salan mabû doktor Fasom ji bavê min re got: ev lawik dê bê av bimire, weke rîhanê ye, av nebe diçilmise!!

Bavê min hewdikekî avê di mal de çê kir û ez herdem di nav de bûm, ez bi avê dijîm, îcar ku pê bimirim jî xem nake!!

171

Dengê pêlin giran ji axaftina wî dihat, te digot qey bayekî hov bi ser derya de rabûye û xuşexuşa pêlan e. min pirs kir: ji ber vê yekê tu avê dicivîn!!

-jiyana min bi avê ye, mirina min jî bi avê ye, Kurd jî weha ne, bê av na be Badîn!! Xewnên min avin, jiyana min av e û mirin jî weha ye!! Tu dizanî çima Alman şikestin Badîn!?

Û bê yî ku li hêvîya bersiva min bimîne got: ji ber ku Hitler gelekî tî dibû!! Pişt re kenekî ne weke ken kir û li binê satila xwe nihêrî û got: rojî tê, Remezan tê, wê xelk rojî bigrin û nema bi roj avê vedixwin, ma ku av ne vî qasî giring bûya xwedê ew di rojên Remezanê de qedexe dikir!?

Min bersiva wî neda û kûr fikirîm; gelo ev dîn e yan em dînin? weke ku dengê hindirê min bibihîze got: dînbûn bi xwe aqilmendîya herî mezin e, xwezî hemî Mehabadî dîn bûna, da ku ji min bawer bikirana!! Ji nişkê ve şilahî kete ode yê û cilên min hemî şil bûn, ez rabûme ser piyan û Emîral axa li cihê xwe ma, li min nihêrî û bi dengê tev li ken got: Kurd ji avê ditirsin, de here mala xwe, av li te nayê.

Nizanim min çawa xatir jê xwest û derketim! Derengî şevê bû û av ji cilên min yê şil diniqutî, Emîral axa di ode ya xwe de ma û li pey min straneke nermik mîna çemekî herikand.

\* \* \*

## 25Temmûz Mehabad

li başûr piranîya pêşmergeyên ku xwîna wan weke dîza li ser tifikekê dikelîya daketin û enîya Seqizê vala bû, piranîyan wan hatin li Bokanê bi cih bûn, êdî dev ji hewdana neyar hate berdan û tenê çend Barzanî û hinek pêşmergeyên ji êlên dî di kozikên xwe de man, yê dî hemî li kar û barên xwe vegeyîyan û çeka xwe xistin nav 172

nivînan!! Ez bi xwe yek ji wanîm, tivinga min ya ku navê Mujde li ser nivîsandî, bû weke darê şivanekî û li dîwarê odeya min ya germ hate daliqandin.

Li bakur germîya Temmûzê Herkî û Şikak jî germ kirin, duh siwarek ji Ormîye hate serdana Pêşewa û bi lez vegeyîya, pêşewa endam û reîsên hikûmetê û efserên pêşmergeyan dawetî civîneke berfireh kirin. Nûrî Emîn jî

di civînê de hazir bû û macerayên wê civînê ji min re guheztin.

-binêre Badîn dostê te Kerîmê Şikakî çi kir?

-keçeke Herkîyan revand!!

-xwezî!!

-xwe di gola Ormîye werkir!!?

-na. Lê di gel çekdarên êla xwe û çekdarên Zêro Begê Herkî êrîşî Azerîyan kirin, derbasî Xoy û Mako jî bûn, eger ez ne şaş bim tengasî li wir peyda bûne û Pêşewa gelekî dilteng bûye, dibêje ku niha ne wexta vekirina enîyeke şer e li bakur, lingên me û Azerîyan bi bendên yek peymanê girêdayî ne, û eger em bi wan re têkevin şer dibê daweta diya Heme Riza, ji xwe nabe em hêza xwe belawela bikin.

-ma ew herdu şar ne yên Kurdanin?! çima wê di destê Azerîyan de bimînin!?

-rast e, belê ne divê serokeşîr wan rizgar bikin, ew ji bo berjewendîyên xwe weha dikin û fikra wan ne gelekî kûr e, ji siya konên êla xwe dûrtir nabînin, pêşewa dibêje: wê Rûs vê tevgerê qebûl nekin û bikin behane ji bo ku hewalîkariya me bikin.

-Rûs Rûs Rûs!!! Her tişt bi destûra wan e?! de bila Stalîn jî Mosko û Stalîngrad ji Almanan re bihişt, çima bi sed hezaran xelk dane kuştin da...

Nûrî hinekî hêrs bû, gotina min birrî û bi sertî got:

Badîn ne di destê min û te de ye, siyaseta ku tê meşandin ji min û te û heta Pêşewa û Mela Mistefa jî mezintir e, em

173

dê keserên xwe daqurtînin û bi bayê re herin û bên, ma tu napirsî çima me koç kir û em ji gund û şarên ku me rizgar kiribûn vekîşîyan!!

Gotinên Nûrî Emîn ne ketin serê min, vekêşana me tiştek bû û ev tiştekî cîyawaz e, me li vir du bajar bi dest xistin e û em hemî dizanin ku herdu yên me ne, ango bajarên Komarê ne, çima û bi çi mafî wê di destê Azerîyan de bimînin?! Divê ez bi çi awayî be Kerîm bibînim yan di rêya nameyekê re macerayê jê nas bikim.

Mehabadî xwe ji meha Remezanê re amade dikin, bê guman wê meyxaneyê Agop jî mehekê sax were girtin, îcar divê çend şûşeyan bi dest bixim yan jî her şev herim mala Xanim û Sultanê li kûçey Cûlekan. Bê guman wê vexwarin vê mehê buha tir bibe û her weha divê ez bi roj bidim xuyakirin ku ez jî bi rojî me!! Havîn ne bes e, rojîya dû dirêj jî bi ser de tê!

Kitêbên dibistanê çap dibin, mîrza Ehmed Ismayîl Zaxettatê navdar- nivîsên li ser bergên kitêban bi şêweyekî gelekî ciwan danîne, ev xetên Erebi çendî nazik û xweşikin û li ser destê vî xettatê şêst salî hîn xweşiktir dibin.

Pêşewa di vê hefteyê de diçe Tehranê, nizamim berê komarê bi kîjan wêranê de ye dîsa!!

Ez dê nameyekê ji Mujde re verêbikim, belkî bikaribe zûtir were, ez nema dûrîya wê tehmûl dikim:

Mujde giyanim

Mehabad bêyî te şarekî wêran e, ma tu ji Şino têr nebûyî!?

De zû were, were da ez vî dilî bo te bikim Şino, vî dilê ku



pê dihesim gupegupên wî êdî hindik mane, ev dilê ku roj  
bi roj dirize û mîna goşiyek tirî di dawîya payîzê de tê ku  
bibe mewîj!!

Mujde were!! bêyî te kavi e ev bajar, wêran e Mehabad.  
Ez dizanim ku rojên min bêyî te mîna şevên tarî û reşin,  
êdî wê şevên min bêyî te çawa bin yara min!! ez pê

174

dihesim ku êdî kurmikên Cobirk ketine bin dilê min û reh  
bi reh diqetînin, wê hişk bibe ev dil bêyî te Mujde.

Divê sibe ez vê parçe nameya xwe ji wê re bihinêrim û  
pişt re biçim ba kalkê xwe li studyo.

\* \* \*

1Tebax 1946 Mehabad

ev çend rojin min dest ne avêtiye pênuşa xwe, ez dizanim  
dema ku ez nanivîsim, pênuşa min êdî gazinan dike û tê ku  
bigirî, ne ku bêriya tilîyên min dike, lê bêriya şewatên min  
û şikestinên min û bextreşîya min dike!! Yek caran ez ji  
pênuşa xwe nefret dikim û dixwazim wê bişikînim, ji ber  
ku tenê ew bi razên vî dilê dîn dizane û tîne der, lê tê  
nabihurim çiku ew jiyana min diparêze.

Yekê tebaxê ye, ev meha rûreş û germ meha ku tê de par  
şerê cîhanê rawestîya û Rûs û Emerîka bi ser ketin û  
dunya li hev par vekirin!! di vê mehê de du bombeyên  
Atomî bi ser du bajarên Japonî de hatin barandin, dibêjin  
bi sedhezaran kes di cih de mirin, çekekî nû û dijwar bû  
ew bombe, di dilê min de jî par bombe ya evîneke Atomî  
teqîya, hîn jî dil dişewite.

Îro ez berêvarê ji çapxaneyê dageriyam ba kalkê xwe û

ew çawa çav li min ket bi Rûsiyeke nerm got:  
pajalosta pajalosta! Ez keniyam û derbas bûm û di cî de  
min pirsî: kalo tu bi qedrê xaçê bikî tu ne kêfxweşî?  
Kalkê min ziq li min nihêrî û got: kurê Ênis tu çawa dizanî  
ez kêfxweşim?! Min bersiv da û got: ez ji zimanên tu pê  
diaxivî dizanim ka rewşa te çawa ye!! dema tu bi Rûsî  
diaxivî tu kêfxweşî, û dema tu bi Farisî diaxivî tu serxweşî  
û dema tu bi Ermenî diaxivî tu xemgînî û dema bi Kurdî  
diaxivî tu engirî yî û ne rihetî!

-û Tirkî? Te çima qala Tirkî nekir kurê gamêşê!?

-min hîn nedîtiye tu bi wî zimanî diaxivî!!

175

-ji roja ku ez ji şerê Sari Qamiş revîya me hîn ez bi Tirkî  
neaxivî me!!

Û kalkê min kete bêdengîyeke bêdawî.

Min ji bîr kiribû ku Agop ev yek bi min dabû naskirin, di  
şeveke serxweşîya me de wi ev tişt gotibûn lê tenê qala  
zimanê rûsî nekiribû, kalkê min jî ji bîrkiriye ew şev.

Li ber siya dikanan xelk diçûn û dihatin, nema cixare di  
nav lêvên wan de ne, duh meha rojiyê dest pêkir,  
hemûyan hazirîya xwe dikirin û tişt dikirrîn.

Roj çû ava û pêjna kesekî nema ji kolanan hat, tenê çend  
pêşmerge bi payebûn û serbilindî li koşeyekî rawestiyabûn  
û dûyê cixareyên wan digiha meydana Çarçira, te digot  
qey girrr ji wan cixareyên ziravik girtine û wan bi kerb û  
kîn dişewitîn. Xuyaye ku wan bawer ne dikir roj têkeve  
pişt çiyê da ku cixareyên xwe vêxin, min hinek nas dikirin  
berî fitarê bi saetekê bi qutîya xwe ya tûtînê dilîstin û

cixare dipêçan û bîn dikirin heta ku dengê azanê dihat li ser cixareyê fitara xwe dikirin. Yê min jî ji roja ku Jale qutîya min diziye ez kê mî dikişînim, min hîn tûtîna weke tûtîna wê qutîya efsaneyî nerm û xweş nedîtiye. Kalkê min weke ku haya wî ji ramanên min hebe cixareyê pêçayî da destê min û got: kurê min ji te re vê tûtîna biçêje tê miriyê xwe ji bîr bikî. û bi dengê nebihîstî di ber xwe de nihurand:

Ev tûtîna misk û e`la

Jê vedixwin mîr û mela

Yê ku dibê tûtîna bela

Ew qet nizanin lezzetê

Ez kenîyam û min pirsî: kê ev gotiye? Xuyaye yekî qelûnkêş bû!!

Kalkê min keserek hilanî û got: ez nizanim, lê rehmetiyê bavê te her ku cixareyek vêdixist weha digot!

şeva îne bû dengê azanên camiyan li hev vedigerîyan, xelk bi zikin têr û devin bi cixare bi qeflan ji malan

176

derdiketin û berê xwe didan limêja Terawîhan, kalkê min kenîya û got: Bado rabe em herin terawîhê xwe li mala Sultanê bikin.

-ez ditirsim dîsa Jale li wir be!!

-ne tirse!! Ez bawerim niha ew li London e.

-li kêra zikê xwe digere li London?

-na, lê li ya nav lingê xwe digere, ji bîr bike kurê min, niha bi du qedehan re wê serê te têkeve cih, Xanima cihû wê dermanê te bide te, de rabe.

Kalkê min derî kilît kir û me berê xwe da kûçey Cûlekan,  
bi rê de ji nişkê ve kalkê min rawestiya û got: Tu dizanî  
Ermenî komarê diajon!?

-çawa?! ma komar payton e yan otomîleke Ford e, yan  
tirên e!!

-mebesta min şofêrên wê hemû Ermenin.

-ez dizanim şofêrê Pêşewa Kurd e, navê wî jî Ehmed e,  
ma Ehmed Ermenî hene!!

kalkê min kenîya û bêdeng da pêşîya min.

xelkên Mehabadê limêja terawîhan dikirin me jî vodka  
vedixwar!! Esedofê Rûsî li wir bû, qedeh li pey qedehê  
vedixwar û weke hîzekî rûn zikê wî dihejiya, te nizanîbû  
gelo dikene, yan xwe dihejîne, Rûsî û Azerî û Kurdî di  
devê wî de mîna firaxan li bin guhê hev diketin, dinav re  
dilê Xanim û Sultanê bi peyva şelom ya ibranî xweş dikir,  
şelom Xanimê, şelom Sultanê, şelom Entranîk, şelom....  
,û disekinî û digot: min ev xort nas ne kir, navê te bi xêr!?

Dema kalkê min digotê ev Badîn e, yek ji Barzanîyan e,  
rûyê wî tirş dibû û gulpek mezin li qedeha xwe dixist.

Kalkê min di ber xwe de ji min re got: ev Esedof e, tu  
dikarî bibêjî konsolosê Rûsya ye li Mehabad, ew tenê li vir  
maye, nizamim li hêviya çî ye!! tûtin hemî birin hîn çî  
maye bibin. ez ji hebûna Esedof ne rihet bûm, nizamim  
min çawa Vodkaya xwe vedixwar, Xanimê tê derxist ku ez  
ne li ser hevim, çavek da min û çû odeyeke dî, min jî weke  
177

da pey wê û derbasî odeyê bûm, ew li ser text veketî bû,  
nizamim bi çî zûbûnê cilên xwe danî bûn, wisa tazî weke

rastîyekê li ser textê hesin bû, lingên xwe ji hev vekiribûn  
û dinalî: biya beçe biya. bi dengekî zarokane digot, ez  
weke nehişîyan çûme bal ve û min kir ku cilê xwe deynim,  
lê wê bi lez dest avête qayîşa pantelonê min û kişand û ez  
tazî kirim, weke makeşêrekê êrîşî navlingên min dikir,  
tîbûneke nedîtî dida xuyakirin, ez har kirim û xistim bin  
xwe, nizanim çi anî serê min, lê bedena min tilî bi tilî  
alast, bînkir û gez kir û mijt, ez nizanim çi qasî dom kir wê  
cenga bedenên tî û sotî, lê ez dizanim kalkê min carekê li  
ser serê min rawestiya û got: ha kurê Ênis!! Xuyaye  
Xanimê dermanê te da te!! Terawîhên te çawabûn berxikê  
min!! ma tê Mujde kengî nîşan bikî lo?  
min bi fedî çavên xwe vekirin û destên xwe avêtin ser  
terrikê xwe û ew veşart, kalkê min kenîya û got: ne tirse  
tiştêk pê nayê, madam ku Xanimê ew nexwariye wê wek  
xwe bimîne!  
Min cilên xwe li xwe kirin û em derketin. Li salonê min  
dît vaye Sedîq Heyderî jî, berpîrsê propagande û  
rageyandinê li komarê rûniştî ye, û qedehek nîvco ji  
Vodka ya tev li ava Purteqalê li ber wî ye, lê min kir ku ez  
wî nas nakim û bêyî ku silavê lê bikim derketim, kalkê  
min pîrsî: ma te ew nas kir? Min got: erê. serê xwe hejand  
û got: ew jî weke te bê Vodka nikare bijî!!  
Ez di Mujde de fikirîm, kalkê min jî weke bombeyekê  
navê wê teqand, weke tayeke germ poşmanîyê ez girtim.  
gelo niha ew çi dike!! Hişê min hêdî hêdî bi bayekê hênik  
ku ji hêla Daşa Mecîd dihat re, hate serê min, min çi kir!!  
Çima wilo zû ez şemitîm û di xefka wê şêrekeça han wer

bûm, gelo ji ber serxweşîya min bû, yan min heyfa xwe di  
rêya Xanimê re ji Jale hildianî?! Yan jî ez gelekî tîyê  
bedena saf û lûs bûm?! Yan jî ji bawerîya min ya ku weke  
siya min bi min ve ye ku ez dê di demeke kin de bimirim!?

178  
Ez negiham tu bersivan, lê bêdeng gihome mal. Kalkê min  
bi rê de distira û difîkand:

Kûçey Cûlekan teng û tarîke

Yekêkî tê da kember barîk e

êdî çirayên malan teka teka vêdiketin, Mehabadî radibûn  
paşîvan, çend sirsirkan bi dijwarî bêdengiya şevê weke  
goleke rawestiyayî diçelqandin, ez ji kêmxewîyê dihatim  
ku ji qama xwe bikevim, lê kêlîka ku ketim odeya xwe û  
min rûpelên spî raxistî li ser maseya xwe dîtin, çivîkên  
xewê firiyan û min nivîsî.

\* \* \*

4Tebax 1946 Şino

Badîn

Min ji zû de dil fikir ku nameyekê bo te rê bikim, lê ji ber  
gelek sebebên ez dereng mam, yek jê kesê ku bawerîya  
min bi wan hatibûya nebûn da ku nameyê pê re bihinêrim.  
yê dî ez gelekî van rojan bêkêf bûm, ji ber ku Haşimof ê  
weke deveyekî dirêj û neyarê di kirasê dostan de, kêfa me  
li me kire jehremar, me bi xwîna xwe û xwêdana siwarên  
Herkî û Şikakan bajarokên xwe ji destê Azerîyan  
derxistin, wî hat bi gefdan û tirsandinê her tişt weke berê  
vegerand. Ji bîr neke Badîn em bi bayê re şer dikin.  
Ez ji Mehabad dûrketim, lê bawer bike rewşê dî ji min re

zelal tir tê xuyakirin, gava tu di govendê de bî, tu tevgera dîlangeran û bizava lingên wan nabînî, tu ya xwe jî nabînî, lê ku tu jê derdikevî, tu her şaşî û her rastiyê jî dibînî, êdî ez jî ji govenda komarê derketî me, tê digihim çi xeletî tên kirin, dizanim ba ji kîjan pencereyê derbasî odeyên me dibe û kulîlkên me diweşîne. bakur!! Bakur e Badîn komar kiriye lîstika berdestan. Êdî ez bêhna wêranekê dikim, lê ez bi xwe jî nema dizanim çare çi ye? Ez tev li hêzên Herkî û Şikakan bûme bêyî ku zanibim çima! Eşîrtî 179

di xwîna min de ye, were ya dawî ez eşîra xwe bi komarê tevî nadim, ew komara ku weke qurban tê amadekirin. Dibe ku te jî bihîstibe, Heme Reşîd xanê Baneyî revîyaye Iraqê, wa diyare ku têkilîyên wî yên bi Ingilîzan re eşkera bûne!! Ew neyarekî eşîra me bû jî û nakokîyên me û wî li ser gundê Temûte hebûn, tu dixwazî wî baş nas bikî ji fermanîdarê Barzanîyan Bekir Ebdulkerîm bipirse, demekê wan baş dijmintîya yek û din dikir.

Tu dizanî sê endamên hizba Tode derbasî Meclisî Şûrayî Millî bûne?! Muzeffar Feyrûz yê ku her kes dizane ew meylîdarê Mosko ye bûye cîgirê Qewam û wezîrê kar!! Tu dizanî ev tê çi wateyê?! êdî Tehran gunnê Mosko mis dide Badîn!! Wê Mosko destê xwe yê hesinî ji ser Mehabad û Tewrêzê rake.

Gelek tişt hene ez dixwazim ji te re bibêjim, lê zimanê min nagere, hûn -çawa be- dikarin ji vê wêranê birevin, çekdarên Barzaniyan ji gelek wêranan derketine, wê ji vê jî bifilitin, lê....

Weke min nivîsî Badîn, zimanê min nagere ez her tiştî bibêjim, mesela Mujde jî ji qedere re bihêle, ew jî weke komarê ye.

Eger ez karibim, ez dê di demeke nêzîk de nameyeke berfireh binivîsim.

Badîn tu vê meha Remezanê çawa dikî? ez dizanim tu meyxurekî afatî û bêyî Vodka debara te nabe! Rast e dibêjin Vodka li Mehabad gelekî buha bû ye?! Li vir erzane, her ku mirov nêzîkî sînorên Rûsya yê dibe Vodka û mirov erzantir dibin!! min karîbûya min dê ji bo te çend şûşe verêbikirana.

Bi xatirê te.

Min ji bîr kir ez bibêjim, yê ku wê nameyê bide destê te, mirovekî ji eşîra me ye û ji xizmên min tê jimartin, û bawerî pê tê kirin, bersiva min bi wî re bişîne, ew dê çend 180

rojan li Mehabad bimîne û ne dûre Şikakên li wan deran hemû pê re vegerin.

Silavan li dost û hogirên me hemûyan bike.

Kerîmê Şikakî- nêçîrvanê bayên bêcîrr.

Ji xwe di vê diltengî û bêzarbûna min de Kerîm û reşbînî ya wî ji min kêmbû, ez dibêjim xwedo yek hebe bîna min fireh bike, Kerîm tê bi her tiştî de dimîze, kalkê min li alîkî û ew li alîkî û nizamim çî li alîkî dî!! Êdî her tişt aşkera bû ye weke qûna bizina qemçik hildayî, lê naxwazim rastiye bibihîzim, ez dizanim kefen ji komara me re li deverekê tê ristin û werîs tene badan, ez dizanim ku ez jî ber bi rastiya xwe de dilezînim û ji neçarî



dinivîsim, van nivîsên ku kes ne dixwîne û ne jî dikare ji ber van tîpên Latînî bixwîne, mirina min ji min ve dixewine, bê guman dê di berfa mirinê de qirêjahiya vê dunyaya min defin bibe, bê guman dê mirin tenê bi kêrî min were, û hemû janên min binax bike.

Ev nameya duyem e ku kerîm dişîne bêyî ku qala mujde têde bike, ev yek jî xewê ji çavên min difrîne. Tişteki xirab bûye ez nizamim çiyê!

\* \* \*

10Tebax 1964 Mehabad

Pêşewa ji Tehranê vegeriya, duh min çapezê wî Ehmed Kol dît, wî ji min re behsa Pêşewa kir ku çawa dilê wî nediçû çayê:

Ev cara yekem e ez dibînim Qazî çaya ku min amade kiriye venaxwe!! berê her ku min piyala çayê li ber wî datanî, bi devekî berken digot: çaya ku Ehmed amade dike li Çînê jî peyda nabe.

181

Ew gelekî dilteng e piştî ku ji Tehranê vegeriyaye, dengê wî kete guhê min digot: Rûsan guh nedane min, Qewam jî roviyeke, Azerî jî bi piştgiriya Rûsan û hêvotina Qewam dixwazin sînoren komara me bikeritînin, Emerxan çû gundê xwe, û Reşîd xan jî revîya!! tişteki jî ji destê me nayê em bikin.

û hêsir di çavên wî de biriqîn, cara yekem e ez Qazî weha mest û jar dibînim, bi şev pê de keser li pey keserê û xew bi çavên wî ne bû. Ehmedê kol ê çayçî digot.

Ez îro neçûme çayxaneyê, min nedixwest çavên min tu

kesî bibînin, lê ji bîntengî min berê xwe da koka çiyayê  
Xezayî, li wir min Luqman -kurê mele Mistefa- û kurê reş  
dîtin ji nêçîra qitikan vedigeriyan, her yekî çend qitik di  
destê wî de û rûyên wan yên nazik û deh dwazde salî ji  
tîna rojê, sor û kurr bûbûn. Min ew herdu sekinandin û  
pirsî: we çawa ev qitik girtin!?

Luqman bersiva min da û got: ew li pirêzeyên zad dilûsin,  
dema pêjna me dikin ji ser hêkên xwe ranabin, ji bo wan  
biparêzin, em jî bi destan û bi hesanî wan digrin!! Kurê reş  
jî bi kêf berê xwe da min û got:

qitik tilûrekî ehmeq e, jê we ye ku sapên genim wî ji ber  
çavên me vedişêre, xwe dimelisîne û em jî torê dihavêjin  
ser. tu qitikekî dixwazî!?

Min bi keser lê vegerand: na spas, qitikên xwe bibin mal.  
Herduyan bi kêfeke bê sînor berê xwe dane bajêr û ez di  
komara weke qitikekê de fikirîm.

\* \* \*

16Tebax-18 remezanê- roja îne Mehabad  
îroj kurekî mele Mistefa hate dunyayê, ji ber ku di  
Remezane de çêbû û di roja îne ya pîroz de, navê wî kirin  
Mes`ûd, ango xwedan bext û behremend, navika wî jî-  
weha tê gotin- daye yê bi xençera bavê wî birrî, ji adetên  
182

Behdîniyan û Kurdên mayî ye ku zarokekî wan dibe,  
navika wî bi amîrekî dibirrin, eger bi şûr yan xençer yan  
kêrê be, ew lawik şervan û egîd derdikeve, eger bi serê  
qelemekê be, xwendevan û edebdost derdikeve û her  
weha, navika wî bi çî were birrîn wê di paşerojê de di wî

babetî de şareza be.

Nizanim navika min bi çi hatiye birrîn, lê guman dikim  
dayeya min ew bi tayê kefenê dayika min Hamêst birrîye!!  
Ji adetaye ku zarokek nû çêdibe jî, yek di guhê wî de azan  
dide, lê kêlîka ku Mes`ûd welidî, ji camiyên Mehabadê  
hemûyan dengê azanê bilind bû.

Divê ez êvarê biçim çapxane yê û serekî li pirtûkên  
dibistanan bixim, ez bawerim çapkirin kuta bûye û êdî  
divê werin belavkirin, meheke dî dibistan dest pê dikin, lê  
ez dê hew mamostetiyê bikim, dibe ku ez diçim şer yan jî  
li xwe vala dibim, lê niha ka ez hinekî derkevim û biçim  
çayxaneyê.

\* \* \*

nîvê şevê derbas bûye, bêdengiya ku bajar tê de dilê min  
xemgîn dike, ez bi giraniya şevê nedihesiyam berê, lê  
niha! her kêlîkek ji çiyayên Mehabad girantir e li ser dilê  
min, ez nizanim çi bi min hatiye!! Êdî cixare jî nema  
xemên min direvînin, ji xwe vexwarin min bi girî ve dike,  
ne dixwazim dostan bibînim, ne jî dixwazim li mal  
bimînim, heta kalkê xwe, yê ku van rojan gazina ji janeke  
nenas di singa xwe de dike, naxwazim bibînim, gelo  
Mujde were dê hinekî bîna min fire neke?! Bê guman erê,  
lê çima deng jê nayê!!

Ji çapxaneyê, ez û Hêmin me berê xwe da mala Hejar, wî  
ez dawetî fitarê kiribûm, lê ew xweş dizanin ku ez rôjî  
nagirim, Hêmin bi rê de henek dikirin û digot: di rojî  
negirtinê de tu li xalanên xwe hatîyî, lome li te nabin, tu  
nîvmusulmanî, nîvxiristiyanî, min jî bi henekî lê vegerand:

ka çî ji Kurdîtîya min re ma!! Keniya û got: ev pirs ji Hejar tê kirin.

Li mala Hejar, li taxa Rizgeyî, her cûre xwarin hate danîn, ava bîrê ya sar, dewê meşkê, meyweyên li ber bayê hênik û di pencereyan de, û xwarinên rengareng rêzkerî bûn, hîn roj neçû bû ava, hemûyan bi dilbijandin li xwarinê dinihêrîn, û li saetên di destên xwe de jî yên ku tiketika wan pîrr giran bûbû, yan weha ji birçîyan re xuya dikir! min jî bi fedî xwe dixiste kirasê rojîgiran, û bi rastî ez jî êdî birçî bûbûm. Dibêjin yê ku rojî nagire bêtir birçî dibe!! çawa roja sor gindirî pişt çîyan, Deng bi camiyan ket û bilintirîn deng ji camiya Rustem Beg ya nêzîkî mala Hejar hat, û bû terqterqa kevçîyên me, rebenên ku di vê roja dirêj û agirîn de bêtirî panzdeh seetan tî mabûn dihatin ku biteqin ji vexawrina avê, kesî li xurmeyan ne pirsî, lê dengê kalekî dihat û digot: xortino xurmeyan bixwin ew sunneta pêximberê ummetê ye, ez di hindirê xwe de keniyam û min di dilê xwe de got: gelo ku li Hicazê, li Mekkeyê kerez hebûna wê xwarina wan nebûya sunnet!? Xwarin bi lez hate rakirin, hemûyan zikê xwe dagirtin û dest bi xwarina meyweyên havînî kirin, pişt re rabûne limêjê û min xwe bi erdê ve kire dirdirk û xwe bi pirtûkekê mijûl kir, dengê hat nizanim ji kê, got: xorto ma tu jî limêj nakî?! Hejar dikir ku bersiva min bide, lê min bi lez got: apo hûn limêja xwe bikin, ez niha bê desmêjim, ezê pişt re bikim.

Piştî demekê civat belav bû û ez û Hêmin û mazûvanê xwe

Hejar bi tenê man.

Hejar piyalên çayê yên newqzirav li ber me danîn û dest avête çend rûpelan û helbestek xwe ya kevin ku li ser meha Remezanê nivîsî bû xwend, ji rûyê Hêmin xuyabû ku wî helbest neeciband, min bi xwe jî neeciband, pesnê rojiyê ji me kême, min di dilê xwe de got. Min dengê xwe ne kir, lê dema Hejar helbest qedand û bêdeng li hêviya

184

dîtina me ma, Hêmin bê dudilî jê re got: kaka tu helbestên milletperwerî û xezelan binivîse, Remezan memezanan ji feqe û meleyan re bihêle!!

Min ji wan bihîst ku êdî êlên Mamiş û Mengûr têkilîyan bi hikûmeta merkezî re li dijî komarê datînin, û min bihîst ku wê piraniya Mengûrî û Mamişîyan ji sînoren komarên bêne derxistin.

-yên mîna wan kesan kurmikin di koka darê de, ku dernekevin wê darê hemî biruxînin. Tu çi dibêjî Badîn? Hejar pirsî, min nizanîbû ez çi bibêjim, lê min gotineke bi mijê pêçayî avête holê û got: xwedê me ji ya mezintir bisitirîne.

-Amîn ya rebbel alemîn. herduyan got.

şeva bêdeng, weke reqeke bejî dimeşiya, axaftinên me weke libên tizbiyeke tayê wê biqete hev nedigirtin, me behsa her tiştî fikir, siyaseta Mosko, Azerî, Paşeroja komarê, helbest û pirtûk, rojî, me behsa kurê Barzanî Mes`ûd yê ku nû bûbû mêvanê dunyayê jî fikir. Civîna me ya berî demekê hate bîra min, em di yek xelekê de dizîvirîn.

Êdî em westiyan û divabû ez vegerim mal, lê berî em rabin  
Hejar pirsî: rast çend roj ji remezanê re mane?! Ez  
keniyam û min got: mahî ki sûd nedaştê, şumerdeni rozhaş  
beray çî?! Ango meha ku fayde tê nebe, jimartina rojên wê  
bo çîye? Ê ez û Hêmin bi ken derketin.

\* \* \*

25Tebax 1946 Mehabad

ev deh rojin min dest neavêtiye pênûsa xwe, ma ez dê çî  
binivîsim?! Êdî ez pê dihesim ku nivîs û rojbuhêrên min  
hemû weke hevin, hemû hêkê yek mirîşkê ne, Mujde li  
Şino ye, Kerîm di nav êla xwe de ye û piştî xwe daye  
komarê, rojî jî weke konekî giran vegirtiye, ez jî geh li ba  
kalkê xwe yê nexweşim, geh li çayxaneyê me, geh jî di  
nava xwêdana xwe de dihelim, ne dikarim bixwînim, ne  
185

binivîsim, ne jî dikarim têra xwe vexwim!! Wêrana ku  
Kerîm behsa wê di nameya xwe de dikir, êdî bîna wê  
ketiye pozê min jî, lê çare çîye? Piştî cejna rojiyê dibistan  
vedibin, lê hîn ez nizanim ka gelo ez dê mamostetiyê  
bikim yan na!?

Ez îro çûme Baxî şêxî li başûrî Mehabad, xelk li wir civiya  
bûn, ji Gerekî Hermeniyân û Serpilûsk û Pişqela û Gerekî  
Hacîhesen û Wênetan û Kûçey Cûlekan û kolan û taxên dî  
bi qeflan dihatin, him ji ber germê him jî ji ber rojiyê û  
tîbûna bêsînor bazdidan, min ji ber dilê xwe yê ku rojê  
hezar carî tê guvaştin û tîna wî nayê şikandin bazda bû. Pê  
dihesiyam ku çiyayê Qullqulax û Xezayî bi hev re li ser  
singa min peya bûne!!

Ez ji hay û hoya xelkê li wir bêzar bûm û neçare min berê  
xwe da Baxî Mîkayîl, hinekî li wir mam û dîsan bi dilekî  
şikestî vegeyame mal.

Eger bajarek li cîhanê pesnê xweşî û pirrbûna bax û  
seyrangehên xwe bike, bê guman ew Mehabad e, hemû  
dar û gul û geya û av û hênkayî ne, tu dibêjî qetek ji  
bihiştê ye xwedê ew li erdê ji bîr kiriye, lê van bax û  
seyrangehan mûyekî dilê min rihet nekirin, ez nizanim  
bela min çî ye van rojan!!

Yek xêz helbest jî nema bi min re derdikeve, ji xwe ku ne  
nivîsandina van rojbuhêran bûya, min dê nivîsandin hemû  
li dû xwe bihişt, û pênsa xwe bikira du qet!! lê weke  
ferza limêjê ez bûyerên ku tûşî min tên yan ez rastî wan  
têm tomar dikim, dizanim jî ku bêhûde ne, lê ku ne ev  
nivîs bin êdî ezê dîn bibim û wê min di qeydan de  
bihavêjin xaneqaha Nehrî.

Ji zû de nameyên heval û hemşarê min Sadiq Behadîne  
Amêdî neketine destê min, nizanim ew li kîjan erdê ye, çî  
dike û çî pê hatiye? Ji xwe Mujde!! Tu dibêjî qey nizane  
name çî ne?! Ez xewnin gelekî nexweş pê dibînim, yek  
caran dibînim ku di nav lepên dêwekî de ye û dikenne, yek

186

caran jî dibînim ku ji jor tê xwarê û ez jî lê dinêrim bêyî  
ku karibim tiştêkî bikim.

têkilîyên min bi Pêşmergeyan re jî kêmbûne, tenê yek  
caran ez Mustafa Xoşnaw dibînim, lê ew jî tim li ser  
nigan, di otomîla xwe de ye, ku çav li min dikeve, carekê  
du caran dike tût tût, silaveke sivik û pirsax hal û deman û

....bi xatirê te!!

Min îro ji kerba hinavên xwe bi darekî stûr li dara tirî da, ne ber digre û ne jî şîn tê, hebûna wê ji bo çi ye?! lê bi rastî weke ku rehên dilê min biqetin, ez bi lêdana wê êşiyam, weke ku evîneke dijwar ji dilê xwe bihavêjim, şewateke seyr berda kezeba min.

Evîn!! Min dîsa ev wêje nivîsî, min dîsa birînên xwe xurandin, bi neynûkin ku nizanin diloanî çi ye.

Waye mele yê camiya Ebbas axa azana mexribê bi dengê xwe yê ne xweş hildide, êdî Mehabadî li malên xwe, li dora xwarinê civiyane û ez jî bi ser birînên hinavê xwe de xwar bûme.

Ez îro piştî nîvro, di qijqija germê de çûme qeyserîya bajêr, di ber Karwanseray Seyid Elî re meşiyam, lê min dil ne fikir ku hevalên xwe yên li wir bibînim, min kolan qut kir û di ber Dibistana Seadet re derbas bûm, Mujde hate bîra min, dema roja yekem çavên me li hev ketin. ez pê dihesim ku êdî ez nema tême bîra wê, naxwe çima heta niha nameyên wê nagihin min!! erê wê digot ez nizanim xweşik binivîsim, lê gava yek evîndar be, dibe helbestvan û gotin weke berxikan li ber pênuşa wî mexel dibin, ne gelekî zor e jina evîndar ji dilketiyê xwe re binivîse: tu çawayî, min bêriya te kiriye!!

ez serê xwe naêşînim, bê guman sebebek heye, ez ji hezkirina wê bawerim û piştrastim, çawa be ew ne Jale ya gawirbav e.

Li qeyserîyê xelk diçûn û dihatin, ji ber ku gelekî germ û qeyserî jî sergirtî ye, xelk rûniştibûn û hin ji wan di xew



187

de, tî û birçî li hêviya dengê azanê bûn. Gavên min bê hemdî min ez ajotim dikana kalkê xwe, lê girtî bû!! ne ew û ne jî Agopê meyfiroş li wir bûn, ez hinekî mam û fikirîm, lê dengê kalê werîsfiroş ji kûranîya dukanê hat û ez veciniqandim: ha xortê jixwerazî!! çavê te lê ye tu meha remezanê jî Vodka vexwî!?

Rûyê wî gelekî sert û hişk bû, ez wê kêlîkê pê hesiyam ku dengê wî mîna werîsekî li stûyê min geriya û hat ku min bixeniqîne, ez ber bi wî ve çûm û min pirsî: gelo çima ev herdu kal ne li karin!?

Kenekî dîn da ser û werîsê di nav destê xwe de avête pişt xwe û got: mamostayê nezan!! kengî Ermenî yekşemê diçin kar!!

Heta wê kêlîkê min nizanîbû ku îro yekşem e, ez li ber xwe ketim, min serê xwe berda ber xwe û hatim ku pişt xwe bidimê, lê bi dengê nerm weke ku lêborînxwestin be bang kir: were hinekî rûne.

Û dest pê kir:

Tu van werîsan dibînî ne?! Ev bûye bîst sal ez di vê qeyserîyê de werîsan difiroşim, yanî ji sala ku Simko axa êrîşî Mehabad kir û vir de ez werîsan difiroşim, wê çaxê temenê min pêncî sal bûn, şervanekî Şikakan derîyê mala me şikand û hat ez bi zorê îname qeyserîyê, min nizanî bû çima ji nav ew qas xelk hatîye pey min, ez ditirsiyam min bikuje û min ne diwêrî bû bipirsim: te çi ji min divê?! heta wî bi xwe got: me gelek mal talan kirîye, em bi hacetî werîsanin ku wî malî li ser pişt xantiran bişidînin!!

Min bi destekî lerizî derîyê dukana xwe vekir û çî werîsê li  
ba min hebûn ji min standin û ji min pirsî: heqê wan çî  
ye?! min xwe ji bîr kiribû, û qet nehate bala min ku  
Mehabad tê talan kirin, min got: axa sê tûmen besin!!  
çî bîbînîm!! heta xwedê qewet û hêz dabûyê sê kulmên  
giran di nav çav û rûyên min wer kirin û got: ha ji te re sê  
tûmen!

188

qundaxa tivinga xwe di pişta min de lêxist û bi ken got: ev  
jî deh Şahî bexşîşa te ne!

Malê talan bûyî ne tenê li pişta qantiran dişidandin, lê li  
pişta xwedîyên mal jî dişidandin û berê wan didane koka  
çiyayê Xezayî.

-Û Simko axa!! razî bû ji vî karî!?

kalê werîsfiroş bersiva min neda, û weke ku pirsî min  
nebihîstibe berdewam kir:

ez pêşewa bûma min dê berê xwe dabûya warê Şikakan û  
tola wê roja reş hilanîya, tu dizanî min dê ew yek bi yek li  
meydanekê kom bikirana û stûyên hemûyan bixista van  
werîsan û di serî de Emerxan û hevalê te Kerîmê Şikakî!!

-ew serdemek bû buhurî, silav li sifra hazire apo!!

-serdem nabuhurin, weke çawa birînên kûr li dewsa xwe  
şopekê dihêlin ew jî wisan e.

ez nizamim çî munasebeta wê çîrokê bû wî kalî di wê  
kelkela germê de ji min re got, ez li gotinên wî rihet  
nebûm û hatim ku derkevim, lê wî bi destê min girt û got:  
ji Barzanîyan re bibêje bila werin werîsan bikin, çend  
mehin wê ji vir bar bikin û muhtacî werîsan bibin, qe ne

be wê barên xwe pê bişidînin!!

Bê xatirxwestin ez ji ba wî derketim û min nefeseke dirêj  
kişand weke ku ez ji mirinekê bifilitim.

Kalkê min ne li mal bû jî, ne jî li mala xanim û Sultanê bû,  
gelo çûye ku!?

Êdî roj dikete pişt Lendî Sêxan û xelk vedigeriyar mal, ez  
jî vegeşiyam Gerekî Şiwanan, taxa ku mala min lê ye, li  
nêzîk camîya Ebbas axa pêrgî qutabîyekî xwe bûm, dema  
çav li min ket serê xwe xiste ber xwe û xwe ji rêya min da  
alî, lê min xwest ez fediya wî birevînim û min pirsî: tu bi  
rojî yî!?

-erê.

189

Û zimanê xwe yê ku ji tîbûnan spî bûye dirêj kir û bi lez  
berê xwe da mal, dengê azanê ji camîyan bilind bû, nema  
pêjna kesî dihat.

Li mal çavên min bi kaxezekê ku bi lez li ser hatî  
nivîsandin ketin: kalkê te gelekî nexweş bû, em dê wî  
bibin nexweşxane ya Rûsî li Tewrêzê. Imze Agop.

\* \* \*

1Eylûl 1946 Tewrêz

nîvê şevê derbas bûye, ez bi tenê li ber serê kalkê xwe yê  
di xew de me, berî kêlîkekê Agop çû mala dostekî xwe.  
Kalkê min dinale û yek caran gotinin ne xuya ji devê wî  
derdikevin, ew bi Ermenî diaxive û hevoka ku ez jê fêm  
dikim tenê: (Hamêst êgûr Hamêst êgûr) e. ew bang li diya  
min Hamêst dike.

vê nîvro yê duktur Samedof yê Rûsî ji min re got: mixabin

tu çare di destê me de nemaye, kalkê te kezeba xwe xera kiriye, wekî din jî dilê wî hinekî werimîye, ez bawer nakim ew bifilite. Min jê pirsî: eger mumkin e em wî bibin Bako?! Serê xwe hejand û got: wext buhurî ye. Li Bako, li Mosko, li Emerîka jî ev derzî û dermanin.

Min nizanibû ez dê di rojên cejna Remezanê de li nexweşxaneyekê bim!! Xelk bi kêf li kolanan diçin û tîn, îro kolana Pehlewî ya ku nexweşxane lê ye ji zarokan dagirtî bû, bi kincên xwe yên rengareng digerîyan û dilîstin, gelo li Mehabadê cejin çawa derbas dibe? Di pencerêyê re li baxçeyê Gulistan dinerim, tarî û bêdeng e, xemgîn e, bayekî hênik çuqlî û şaxên devîyan dihejîne. Dengê wî bayê hênik tev li nalînên kalkê min dibe û xewê ji çavên min direvîne.

Min dixwest ez li Tewrêzê hinekî rewşa vê komarê jî nas bikim lê mixabin, ev çend rojin ez nikarim dûrî kalkê xwe biçim, çend caran Agop got Badîn here hinekî bîna xwe derxe, ezê li ber kalkê te bim, lê ez ditirtsim dema kalkê

190  
min bimire, ez ne li ber serê wî bim. Eger hinekî ew bi ser xwe ve were ez dê li nava Tewrêzê bigerim.

\* \* \*

berî seetekê kalkê min çavên xwe vekirin, dema ez li ber serê xwe dîtîm, bi zorê kenek li ser lêvên xwe resim kir û gote min: Bado tu hîn şiyarî!?

-erê kalo, tu xwe çawa dibînî!?

-ez başim, ji berê çêtirim! Piştî nefesek dirêj çavên xwe dane ser hev û got: kurê min jiyan ev e! tu dibînî dawiya

wê çî gû ye!! Îcar te fehm kir çîma min deqeyek ji temenê xwe vala bernedida!! Carekê mirov dijî, carekê tenê! û divê rastî bijî, yan na hatina wî ya dunyayê weke nehatinê ye. Min gelek tişt ji te re gotin e, bike guhar di guhê xwe de. Guh nede gotinên van duxtoran, ez dibihîzim ew çî dibêjin, dibêjin sûcê Vodka û vexwarinê ye ne?! Na welleh ne rast e, sûcê demê ye ku mirov dihêre. Ez vexwim jî dê bimirim, nevexwim jî ev dawîya gû ye. Îcar mehrûmî ji bo çî!?

Pişt re kenîya û got: te jina duxtor Semedof dît? Navê wê Nadiya ye, ew ji Mosko ye û duxtora çavan e, lê bawer bike duxtora dil û kezaban e jî, eger wê ez ilac kiribûma ez dê li ser destê wê yê nazik rihet bûbûma.

Ez hinekî kenîyam û min got: kalo halê te ne yê ku tu xwe bi axaftinê biwestînî, xew ji te re baştir e!!

-xew!! Kurro tê bimînî ker. Tu gû di jîyanê de nemaye, ez rabim bi xewê derbas bikim!! Ez ji te bêtir dizanim ku temenê min yê mayî çend seetin! Guhê gorê îcar bi rastî û zelal ji min ve xuyaye, lê ji kîrê te ve, min têra xwe derd dîtî, û min têra xwe xweşî jî dît, min xwe ji tiştêkî bêpar nekîr, tu qet bi keçikeke reşîk re razayî?! Şîreta min li te wê jî biceribîne, navlingên wan ji tenûra sincirî jî germ tir in.

lê tenê ez dê bi hesretekê bimrim, xwezî hema çend mehên dî jî ez mabûma û min ji te re bigota: binêre Badîn Rûsan  
191

çî anî serê we!!! Ne ji bo ez kêfan li we xweş bikim, lê tenê ji bo tu aqil bigrî.

Badîn ji wan re bibêje bila hew derzîyan li min bixin,  
kulêmekên min bûne bêjing, fayde nemaye, bihêlin ez  
rihet bimrim, û tu bi ya min bikî tê sibe min ji vê xana  
genî derxînî û bibî Mehabad.

Hêdî hêdî kalkê min girantir axivî û dîsa kete xew.

Ez di mirina xwe de gav û seet difikirim, lê cara yekem e  
ez pêjna mirinê, lê ne ya xwe, ji nêzîk de dikim. Min  
dîtîye çawa mêr li ber çavên min di şeran de ji qama xwe  
dikevin û têne kuştin, lê mirina ku hêdî hêdî dibe!! Ne  
hêsan e mirovek zanibe ku êdî destê wî ji vê dunyaya  
gewrik têne şûştin û hindik maye binax bibe, hindik maye  
kurmin birçî tevna bedena wî ji hev verêsin. Ax çi dût e  
mirin, çi nêzîk e mirin.

\* \* \*

2Eylûl 1946 Tewrêz- Nexweşxane ya Rûsî  
Îro Agop hat û bi dizî şûşe yek Vodka ji kalkê min re anî  
bû, ez li balkona odeyê bûm, min cixareyek dikişand û li  
darên baxçeyê binê nexweşxaneyê dinêrî. Dengê çingîniya  
qedehan hate min, ez bi lez derbasî odeyê bûm, çi  
binêrim!! Agop li alîyekî, kalkê min li alîyekî dî, her yekî  
qedehê di destê wî de û tiqtiqa kenê wan e! min qedeha  
kalkê xwe bi zirzî ji dest girt û bi hêrs berê xwe da Agop û  
heta xwedê deng daye min, ez qîrîyam:

-çavê te lê ye tu kalkê min bikujî!!

-Badîn, kerê ji keran! Tu dîn bûyî! Ha! ne sûtê wî ye, dilê  
min dibije vê jehra han, min jê re got here bîne, Vodka li  
Tewrêzê gelekî erzan e kero.

-rewşa te ne ya vexwarinê ye kalo, erzan buha ferq nake,

lê siheta te!

-kuro tu gû di rojên min de nemaye bihêle ez têrvexwarin bimirim.

192

Agop gelekî li ber xwe ket, şûşeya Vodka ya nîvco mayî xiste tûrikekî û hat ku derkeve, lê min bi destê wî girt û rûyê wî du sê caran ramûsa û lêborîn jê xwest, kalkê min keniya û got:

-wey tu bibî qurbana Agop. De here gunê wî ramûse ne rûyê wî. Pişt re bi Ermenî ji wî re li ser min got: dehşik e û zîtirk dan!! bibûre.

-kalo kesekî min ji te û pîrka min pê ve nemaye, ez naxwazim bi hesanî te ji dest xwe derbidim.

Agop kenîya û got: yê ku bibihîze wê guman bike ku kalkê te malê Qarûn li dû xwe hiştîye û tu jî li hêvîya mîratê wî yî, kuro ji şûşeyên vala pê ve milkê wî nîne, heta dukan jî ne ya wî ye, ya yekî Cihû ye kalkê te bi kirê tê de ye.

Min tûrikê Vodka ji destê Agop girt û veşart û bi ken ji kalkê xwe re got: bi xêr nêzîk em dê ji vê nexweşxane yê derkevin û li Mehabd şevbuhêrekê li dar bixin, emê têr Vodka vexwin.

-tu qûna xwe bibînî tu wê rojê nema dibînî, ji te we ye ez nizanim êşa min çendî xedar e?! vingevinga melkemot e li ser serê min, ez wî dibînim çawa qîlên xwe tûj dike da ku giyanê min biqetîne. Lê tu dikarî vê Vodkayê li ber kêla serê min birijînî.

Kalkê min dîsa kete xew, min bi destê Agop girt û em

çûne balkonê û me her yek cixareyek sor kir.

\* \* \*

Êvarê ez ji nexweşxaneyê derketim û hinekî li navenda  
Tewrêz geriyam, tu dibêjî qey tu li bajarekî Rûsya yî!!  
piranîya xelkê, bi Rûsî diaxivîn, nizanim Rûsin yan na!?  
wêneyên Stalîn li her koşê û mehelle û zikakê daliqandî  
ne, nivîsên Rûsî li ser dîwaran û alin sor û neqşên das û  
çakûçan li her deverê ne, xwedê kir Mehabad ne weha ye,  
wê bîna min qet lê derneketibûya. lê bi rastî Tewrêz xweş  
e, paytexta şah Ismayîlê Sefewî yê ku di şerê Çaldêranê de  
193

şikest, bajarê karxaneya mezin ya xalîçeyan ya ku  
Almanan ava kiribû û piranîya hirîya wê ji bajarê Şino  
dianîn, ew karxane ya ku kerîmê Şikakî tê de dixebitî  
dema ku zarok bû, berî ku Rûs wê karxane ya herî mezin li  
Îranê bikin qişleyek ji bo serbazên xwe. Bajarê  
şemendefêr û tirênan, min stasyona tirênên ku diçin Bako  
jî ziyaret kir, xwezî yek li Mehabad jî hebûya wê gelek  
rihetî ji xelkê re peyda bûya.

Tewrêz e bajarê her xweşiyê ye, min kitêbxaneya Suruşt  
jî, ya ku Pêşewa her cara tê Tewrêz wê ziyaret dike û çend  
pirtûk dikirre dît. Tewrêz e, bajarê ku kalkê min di  
nexweşxaneyê wê de ji ber jana kezebê dinale.

Tiştê ku bala min bêtir kişandîye van çend rojan, rûdêna  
xelkê wê ye, tirsek e mezin li ser her rûyî ye, û her kes li  
pişt xwe dizivir e, dibêjî qey kes dide pey wan!! ji xwe  
mirov nizane ku cejn e li vî bajarî, ji bilî zarokan hayê tu  
kesî ji cejnê nîne, berevajî Mehabad e. dibêjin gelek



hebixane li vir hene û tède gelek zindaniyê bîr û  
bawerîyê, ji bilî yên diz û qellaş jî hene.

Nalînên kalkê min zêde dibin û xirxir bi sînga wî ketîye.  
Nexweşxane bêdeng e, Agop jî li ber serê hevalê xwe di  
xew re çûye. Kêlîkeke dî wê Hemşîre û peristara Azerî ya  
nazik Nûray were û derzîya êvarê li kalkê min bide.

\* \* \*

6Eylûl 1946 Mehabad

Çû, kalkê min barkir, mir!! nizanim çi li ser mirina wî  
bibêjim, çi binivîsim!!

Dema ruh jê kişîya, ez û Agop û Nûray ya Azerî tenê li ber  
serê wî bûn, çavên wî vekirî bûn û li Nûray dinêrî, Agop  
zer bûbû û bi Ermenî dua dikirin, xaçek bi destê xwe yê  
rastê resim dikir û bi çavin tijî hêsir li kalkê min dinêrî.  
Min nizanibû çi bikim yan çi bibêjim!! Bayekî nermik li  
derve pelên çinar û şengebîyên baxçeyê Gulistan  
diwerandin.

194

Kalkê min bi dengê melûl û tijî lav û niyaz got ez tî me,  
min piyala avê rakir û nêzîkî lêvên wî yên hişk û zuwa kir,  
lê wî bi destê xwe ew pial da alî û li Agop nihêrî, Agop  
mebesta wî fêhm kir û qedeha Vodka anî, Nûray bi xeyd  
got: ne rewa ye, çê nabe di vî halî de hûn Vodka bidin vî  
nexweşî, ji xwedê bitirsin. Kalkê min bi destê wê girt û bi  
hêvî jê re got: Nûray! Allah aşqına  
Me bêdeng li hev nihêrî û Nûray bi destê xwe qurtek du  
qurt dane kalkê min. kalkê min çavên xwe dane ser hev û  
bi razîbûn got: de bila niha ez bimirim. Ê serê wî bi rexekî

bû.

Mir.

Ez xwarî wî bûm û girîyam, Agop jî li ser kursîyekê hate xwarê û bû iskeiska wî. Nûray hêsirên xwe damalindin û bi destê min girt, ez ji ser singa kalkê min rakirim û xavikeke spî avête ser rûyê wî û got: mir, bila hûn sax bin.

Êdî hindik mabû roj hilê, Nûray derket û kaxezên mirina wî amade kirin, ez û Agop tenê di wê sibeha zû de li ber serê wî bûn, li ber wê bedena bêgiyan, em ji hal ketibûn û bêdeng digirîyan, Agop şûşeya Vodka bi dawî kir û her carê bi Ermenî digot: ez bi tenê mam, bi tenê, ez sêwî bûm.

Sibehê Kerîmê Şikakî hat, dema çav li min ket ez dame ber hemêza xwe û sersaxiya min kir û ber dilê min da: -bibûre Badîn, ez duh pê hesiyam ku tu li Tewrêzî, jiyan ev e, dawî mirin e, bila serê te sax be, kalkê te têra xwe jiyan kir.

Min nizanibû çî bibêjim, serê min di nav herdu destên min de bû û min bawer nedikir, yan min nedixwest bawer bikim ku kalkê min mirîye.

Ber nîvro Jîpek Rûsî hat Mîrhac tê de bû, Mîrhacê ku weke efserê peywendîyên Azerbaycan û Kurdistanê li Tewrêz rûdinişt, wî jî ber dilê min da û got: tu qehremanekî Barzanîyanî, nabe tu li ber bûyerek wisa jar û

195  
melûl bibî. û kalkê min yê ku di nava darbestekê de ramediyayî, avêtin dawîya jîpê û me berê xwe da

Mehabad. Lê Kerîm nehat, got divê ez vegerim Zenddeşt,

Emerxan vegeîyaye, Şikakên li Mehabad hemî hatine,  
divê em li rex wî bin!!

Dilê min nebû ez di wan kêlîkên xemgîn de munaqeşeyê  
bikim, min xatir ji Kerîm xwest û spasîya Mîrhac kir û li  
rex şofêrê Jîpê rûniştim, Agop jî li ber darbesta ku kalkê  
min tê de ramediyayî rûnişt û em hatin Mehabad.

Ev bûne sê roj me kalkê xwe li goristan Ermenîyan li  
nêzîk navçeya Sê Aşan defin kirîye, her ku ez diçim  
ziyareta gora wî, ez Agop li wir dibînim, şûşeya Vodka di  
destê wî de ye, qurtekê vedixwe, yekê li ser kêla serê  
kalkê min dirijîne.

Kirêçiyê dukanê îro hat û serxweşîya min û Agop kir, pişt  
re bi devnêrmî got: mirin heq e, em dê hemî ji vê tasê  
vexwin. Îcar adeta dinyayê....

Û hat ku biaxive, lê min gotina wî birrî û kilîtên dukanê ji  
berîka xwe derxistin û jê re got: gelekî spas, heq heq e, kes  
jê nareve, evin kilîtên te, lê tu dizanî kamera û tiştên kalkê  
min di dukanê de hene..

Agop gotina min birrî û bi xemgînî got: Badîn ku ew çû!!  
Bila kamera jî bi qurbana te bin. Yê kirêçî gotina xwe ya  
ku dikira bigota, berdewam kir: eger hûn bixwazin ez dê  
tiştên di dukanê de bikirrim.

Me li hev kir û piştî mêrik rabû, min pere hemû dane  
Agop û jê re got: eger mirovek misteheqî mîratê kalkê min  
be, tu yî!!

\* \* \*

10Eylûl 1946 Mehabad

Dibistanan derîyên xwe careke dî vekirin, û hîn Mujde

venegerîyaye!! Min berî du rojan nameyek jê re rê kir û tê de behsa mirina kalkê xwe kir, ez bawerim wê bûyera mirinê ji Kerîm bihîstîye, lê çi çê bûye ku li min napirse!!

196

nizanim ez herim Şino? Na, ka ez hinekî xwe ragirim û li hêviya bersiva Mujde bimînim û fehm bikim çi mesele ye li min napirse.

Dilê min nema dixwaze ez ji mal derkevim, Hejar çend carî ez dawetî şevbuhêrkan kirim lê min lêborîn xwest, min nizanîbû ez dê vî qasî li ber mirina kalkê xwe bikevim. Ji min bêtir Agop ne li ser hev e. îroj hate ba min, têra xwe serxweş bûbû, min zanîbû ew ji goristanê vedigere, çavên wî sor bûbûn û fişefişa pozê wî bû. Em hinekî bêdeng man û me bi hev re li fotoyê kalkê min yê bi dîwar ve daleqandî dinêrî, piştî wê bêdengîya giran Agop bêyî ku li min binêre got: tu dizanî ez çi difikirim? -tu çi difikirî apê Agop!?

-ez difikirim ji Mehabad bar bikim!!

-tê berê xwe bidî ku? Mirin li her warî heye.

-Êrîvanê, ez dê herim Hayistanê, nema tebata min tê, mimkun bûya min dê hestîyên kalkê te jî bi xwe re biribana. Tu dizanî ew her kesê min bû Badîn.

Hêsin zelal ji çavên wî yên sor diherikîn, û cixare ji nav lêvên wî yên hişk nediket.

Min nikarîbû ez ber dilê wî bidim, ez bi xwe bi hacetî yekî me ku ber dilê min bide.

Piştî bêdengîyeke girantir, hinekî rûyê wî vebû û got: tu têyî em biçin mala Xanimê!! Emanetekî kalkê te li ba wê

ye, dixwaze bide te.

Êvarê em li wir bûn, piştî xwarin û vexwarinê, Xanimê  
buxçeyek biçûk anî û da min:

-kalkê te wesiyet kir ez vê buxçeyê teslîmî te bikim, ez bi  
xwe nizanim çî tê de heye, wî ez bi Tewratê sonkirin dam  
ku nevekim, ha binêre ev hîn girêdana destê wî ye.

Min girêkên wê yek li dû yekê vekirin, kalkê min ew qasî  
asê kiribû ku Agop û Xanimê kenîyan û gotin: rehmetî  
hesabê vekirinê nekirîye.

197

Dawî hemî girêk vebûn, sed Tûmen yên deh deh li hev  
rapêçabûn û kaxezek biçûk jî di nav wan de bû. Min û  
Agop me li hev nihêrî û bi destin lerizî min kaxez vekir û  
xwend, bi Farisî tê de nivîsî bû:

Ev wesiyeta min e:

kurê min, bi qasî tu xwîngermî û ji komarê re dixebitî û  
amade yî canê xwe jî fida bikî di rêya welatê xwe de, ez jî  
weha bûm, lê ez mirovekî pîrim, niha Ermenistan ne bi  
hacetî min e. heta min karibû min xizmet kir, û pişt re min  
nihêrî her tişt hîç e, ji ber ku bi dilê mirov nabe, rewş  
dimîne ew rewş. tim yên li jor û serdest ne li gora dilê  
mirov in. nefikire ez dijminê vê komarê bûm, na welleh  
belkî ji te bêtir ez ji Pêşewa hez dikim û qedr û qîmeta wî  
dizanim, bûye kêmkî salekê tu wî nas dikî, ez ji zû de wî nas  
dikim, ew mirovekî heta tu bixwazî saf û dilpak e, lê ketîye  
konikê pîrê û bawer nakim bikaribe xwe jê rizgar bike. Ev  
Rûsin!! tu kiryarên wan ji min û Agop bipirse. Ez serê te  
naêşînim, Ev pere sed Tûmenin, tiştê ku min karîbû

hilanîya, jê pê ve min tu mal li pey xwe nehiştîye, dukan û hewş min kirê kirine, ez ne dîn bûm malekê bikirim û xweş dizanim ku tê de mêvanê çend salan im. Vî sed Tûmenî tu çawa xerc dikî bike, lê xwe ji vexwarinê bêpar neke û heqê keçik û jinan bide wan, li ber evînê jar û sist nebe.

min ji Agop re tiştê nehişt, ew eslen ne bi hacetî tiştê ye. wesiya min lê ew e ku her dilê wî vexwarin xwest bila were ber serê min û qedehekê li ber kêla serê min birijîne. ji bo te ez gelekî axivîme, eger min ew gotin ji qantirê re kiribûna, wê niha ji qantirbûna xwe derketibûya. Selam. Min nivîsa kalkê xwe bi dengekî bilind dixwend û dema ez ghiştim devera ku tê de qala Agop dike, bû orînîya wî û bi lez ji xanê derket.

Dilê min ji dunyayê sar bû, xanimê qedeha Vodka tev li Qeşa û xoşava Pûrteqalan li ber min danî û hat li rex min rûnişt, destê xwe li stûyê min gerand û got: xorto divê tu 198

weke kalkê xwe bî. Wî xema dunyayê, mirin û jiyanê hîç nedixwar.

Tu dizanî malbata me di her tiştî de pê dişewirî!! Berî demekê me bihîst Cihû diçin Filestînê, digotin li wir malan û erdan didine wan, halê wan gelekî xweş dibe, Ingilîzan jî qenc alîkarîya kesên ku dixwestin bar bikin, dikir. me jî dil dikir em herin, lê kalkê te ji me re got:

hûnê herin li kêra zikê xwe bigerin, çî we li wir heye!!

Ha!! Dev ji derewan berdin û guh li van tacirên mirovan nekin, ew dê komek pere serê her yekî têxin berîka xwe û we bihavêjin çolê weke ku çawa Musa çil salî li beyabana

Sînayê winda bû, hûn bixwazin dikarin li ber her dîwarî bigirîn.!!

Badîn bawer bike ya kalkê te rast bû, warê me ev e, devera ku em lê ji dayik bûne û me çavên xwe li rojên wê yên zêrîn vekirine. Wî jî tim digot: Ermenistana min dukana min e û ev Vodka welatê min e.

Xanimê kêlîkekê bêdeng ma, li qedeha min ya Vodka, ya ku bi dawî bûbû nihêrî, yeke dî dagirt û ez bi dû xwe de kişandim odeya xwe.

\* \* \*

13Eylûl 1946 Mehabad

ev du rojin ez bi karekî nû daketime, ji mamostetîyê ne dûr e, lê bi gelekî jê xweştir e, ew jî bi saya Menaf Kerîmî bû, hat û gote min: em dê kesên bi emir mezin ku xwendinê nizanin, fêrî xwendin û nivîsandinê bikin, eger tu di xwe re dibînî her êvar were Kangay Hizbî Demoqrat û dersên nivîsandinê bide van rebenan.

Ez ji vî karî re germ bûm, û bi eşq êdî diçim wan pîrmêrên Mehabadî fêrî xwendin û nivîsandinê dikim.

kalkê min valahîyek di jiyana min hişt, ji valahîya ku Mujde li pey xwe hêlaye mezintir e, divê ez xerîkî karekî bibim ku pirr neponijim û dîsa derkevim nava civatê.

199

Agop nema êdî meyxane ya xwe vedike, karê wî serxweşî û awarebûna li kolanên Mehabad e û xewa li ber siya darên çinarê û kêla gora kalkê min e.

Rewşa wî ya xirab dilê min diguvêşe, lê ez nikarim alîkarîya wî bikim, gelek caran ez wî li ber gora kalkê xwe

dibînim ketîye xew , naçare wî şiyar dikim û tînim mal.  
Ev bûye demeke dirêj dengê cîrana min xûşka Heme  
Resûl nedihat, lê îro çavên min pê ketin di pencere yê de  
bêdeng rawestîya bû û li dirêjahîya gerekî Şiwanan dinêrî,  
ji nişkê ve Emîral Axa xuyabû ji hêla taxa Xirê dihat û li  
ber pencere ya wê rawestîya, weke her gavê parsa avê  
dikir, min li wan guhdarî dikir û hayê wan ji min nebû,  
dengê xûşka Heme Resûl dihat ji Emîral Axa re digot: av  
li mala min nîne, te hêsir divên?! Wî bi ken bersiva wê da  
û got: hêsir ji avê germ tirin û şortirin, ji deryayekê re bi  
kêrtirin. Ê satila xwe bilind kir, heta nêzîkî rûyê wê kir,  
pişt re spasîya wê kir û meşîya.

Niha bayekî hênik ji hêla Şino tê, na ev bayê nerm û hênik  
ji Amêdyê tê, ez bayê Amêdyê nas dikim, weke nalînan û  
henasên evîndarn e, bayekî serxweş e bi şewat û xemgîn e,  
Kerîm jî nikare vî bayê nerm û tenik têxe xefkên xwe yên  
nedîtî. Carekê wî digot: nifşek ba heye nakeve xefkan, ew  
bayê ku tev li axînên birîndaran dibe û giran giran tê  
xwarê, ew ba xefkan dibîne û xefk wî nabînin!!

\* \* \*

berî çend rojan dema ez ji mala keçika Cihû vegeşîyam,  
min rêya xwe bi Qeyserîyê xist, hinekî li ber dukana kalkê  
xwe ya girtî rawestîyam û bêhemdî min hêsrên min  
herikîn, kalê werîsfiroş yê di kûranîya dukana xwe de  
werîsek badida, bi dengê dilovan - cara yekem bû ez  
dilovanîyê di dengê wî de dibînim- bang li min kir.

-were rûne.

200



Dema derbas bûm, min sê kodikên tijî zeyt dîtîn, her qutîyek werîsek tê de bû, ez behitîm û dîsa tirsê ez zeft kirim.

-ev çi ne!?

-berî çend rojan cejna Remezanê bû, xelk bi cilên xwe yê rengîn û devên li ken çûbûne seyrangehên Baxî Sîse û Kanî Mam Qenberan û Lalebas û yê dî, ez li mal bûm û min dukana xwe girtibû, carekê dengê derî hat, dema min vekir çav li efserekî Îranî ketim, min bawer nekir, çend caran çavên xwe mis dan, lê nebawerkirina min bi du gotinên Farisî yeke qebe bû bawerîyeke bêguman.

-zûd bikun.

Ew peyk û şandîyê general Rezmara bû, hatibû Mehabadê da ku bi Pêşewa re lihevkirinekê li darbixe, ew serheng Elî Esxer Fuyûzî bû.

Min dukana xwe ji bo wî vekir, wî di cî de sê werîs bijartin û neh Tûmen xistin berîka min û got:

Her sê yan têxe nava zeytê û bila emanet bin li ba te, heta ez careke dî tîm!!

Min jê pirsî: ji bo hêlanan dixwazî ne? wî got: erê lê ne ji zarokan re, ji bo hêlanên mirinê ne ev werîs! gelo mebesta wî çi ye?

Min bersiva wî neda û bi kerb derketim bêyî ku xatir jê bixwazim, dengê kenê wî yê dîn li pey min weke tavekê dihat, dema ez gihame serê kolanê min dît ew ji dukana xwe derket û bang kir: netirse, ne ji bo stûyê te ne ev werîs!!

\* \* \*

16Eylûl 1946

vê sibê ez bê vexwarina qehwê ji mal derketim û min berê xwe da çapxaneyê. nêzîkî meh û nîvekê ye ez fêrî vexwarina qehweya sibê bû me, ew bi xwe ji adetên kesên têr e, mirovê xizan û perîşan ji ku di xwe re dibîne sibehan xwe li ber fincana qehwê pehn û dirêj bike û cigareyan

201

bikuşkuşîne!! Berê min jî di xwe re nedidît, hema bi zorê min xwe digihande dibistanê, gelek caran jî ez dereng dimam, ji xwe li çiyê û di nava jiyana pêşmergetiyê de, vexwarina qehwa sibê ji Barzanî bi xwe re jî dernakeve. Li çapxaneyê gelek kes kom bûbûn, Hejar û Hêmin, Sedîq Heyderî, Qadir Muderrisî, Hisên Mîkayîlî û hin kesên dî jî hebûn min ew nas nedikirin, tenê wêneyê Stalîn yê ku her cara mirov derbasî çapxaneyê dibû dikete rûyê mirov, ne xuya bû. Lê dewsa mîxê ku pê ve dailqîya bû hîn hebû, min bi ken ji Hejar pirsî (cara yekem bû ku ez piştî mirina kalkê xwe dikenim): Stalîn axa bi ku de çûye? Weke ku ew di pirsê min negihişt pirsî: kî? Min bi serê xwe îşaretî dîwarê ku berê wêneyê Stalîn ew xemilandibû kir. Hejar gerafeta xwe ediland û di guhê min de got: îro mêvanekî me yê Emerîkî tê, niha Hemîd Mazûcî li vir bû, wî bi lez wêneyê Stalîn rakir û çû, ne tenê li vir, lê li her deverê wêneyên Stalîn hatin rakirin, Pêşewa weha ferman kiribû. Lê bê guman wê çavên vî mêvanî bi gelek wêneyên wî ketibin. Seetek neçû dengê gurîniya Jîpekê hat, em derketin pêrgîniya mêvanê Mehabadê yê Emerîkî.

Navê wî Arşîbald Rozfelt bû, ew karmendekî balyozxane ya Emerîka li Tehranê ye, rûyê wî geş û devê wî li ken bû, derbasî hindir bû û yek bi yek destê me bi germî guvaşt û silav li me kir.

Mudîrê çapxaneyê xêrhatin pê kir û çend hejmarên rojnameya Kurdistan û hinek kovar û dîwanên helbestan diyarî wî kirin, weke baranê (Thank you )ji devê A.

Rozfelt dibarîya, wî kêfa xwe gelekî dida xuyakirin, û her rojname yek digirt bi kenekî çêkirî digot: very good, nice, oh my God!!

Pişt re ew û mudîrê çapxane yê bi tenê man û em derketin, li derve şofêrê wî yê Ermenî (navê wî Gerabêt bû) li pişt direksiyonê Jîpê di xew re çûbû, kalkê min hate 202

bîra min, min di dilê xwe de got: Ermenî ne tenê komarê diajon, lê xuyaye balyozxaneyên li Tehranê jî diajon, ne dûr e Ermenî ji hesin çêbûne ne ji axê!!

Êdî payîzê şerê xwe yê bi havîna germ û dogehîn re bi dawî anî bû û bi ser ketibû, dunya hênik bûbû, û roj kin bûbûn, ewrin spî û tenik û dûr ezmanê Mehabad yê şîn dixemilandin, ber nîvro, qutabî bi kêf ji dibistanan vedigerîyan mal, geleskan ji wan bi bazdan berê xwe didane malên xwe, hin ji wan jî li serê kolanan rawestîya bûn û dilîstin, ez û Hejar û Hêmin hinekî li qeyserîyê gerîyan, min nedixwest ez nêzîkî dukana kalkê xwe bibim, min ji wan re got: ka em biçin xwarinekê bixun. Û me berê xwe da xwaringeha Hemeşel yê kebabçî li nêzîk meydanî Asingeran. Ew kebabçîyê herî navdar e li

Mehabad, kalkê min her dem ez dişandim ba wî û min kebab ji wir dianî.

Roj êdî diçû ava û seet ber bi çar ve diçû, Hejar li seeta di destê xwe de nihêrî, û bê yî ku qedeha xwe ya çayê tamam bike, bi lez rabû û got: divê ez herim radyo ya Mehabad. ez û Hêmin jî rabûn û di Meydana Çarçira re çûn li nêzîkî Pirdî Spî rûniştin.

Bayê ku ji hêla Daşa Mecîd radibû pêlin biçûk li ser ava Sablaxê resim dikir, piştî bêdengîyeke dirêj Hêmin gote min: Badîn ka te zewaca xwe çawa kir, daweta te kengî ye? Min bi xemgînî lê vegerand û got: di destê Emerxanê Şikakî de ye!!

-ya wî çî ye Badîn!!?

-tu dizanî xwestî ya min Şikak e, û wan jî hemîyan piştî xwe daye komarê, Kerîm û Mujde jî li ber bayê Şikakan weke pelên vê payîzê ne, kê bawer dikir Kerîm di vê tengayê de berê xwe bide Şino? Hema wî da pey eşîrtiya xwe û dev ji Mehabad berda, Mujde çawa piştî xwe da min!! Divê ez jî bidim pey wan û nas bikim çî bûye.

-wê her tişt weke xwe vegere, bawer bike, çend rojin wê  
203

Kerîm jî, Mujde jî, ez nabêjim Emerxan, vegerin Mehabad, ne hesan e ew xwe ji me qut bikin, ez Kerîm qenc nas dikim.

Min dixwest ez bawer bikim, lê ez jî Kerîm nas dikim û eşîrtî ya wî ya ku heta hestîyê wî çûye jî baş nas dikim, behsa Kerîm û bayên ku ew dixwaze wan têxe xefkên xwe jî êdî min dixê gumanin kûr, gelo çima ew qasî gotinên wî

bi mijê pêçayî bûn? Ba tê çî wateyê li ba wî, û çawa dikeve xefkan? Nû ev tişt min diheyirînin.  
min berê axaftinê guherî û ji Hêmin re got: payîza komarê ye êdî. Wî mebesta min fehm nekir û serê xwe hejand û got: li her derê payîz e.  
Dawî me xatir ji hev xwest û ez çûme karê xwe.  
Fêkirina kesên bi emir mezin gelekî zor e, lê ez rihetîya xwe tê de bêtir dibînim, dibe ku Mujde li vir bûya min mamostetî bikira, lê bêyî wê dibistan tirafa bîranînên min tev dide û pêtîyên li ber vemirandinê ne geş dike.  
Xuyaye Mujde nema li min dipirse, ez dibêjim nameyên min nagihên destê wê!! Yan jî ew ne li Şino ye!! Divê ez destûrê bixwazim û serekî lê bidim, ez wê bi xwe nebînim nabe, bi name yan mesele çareser nabin, ku çavên min ne di çavên wê de bin, ez nikarim tişteki fehm bikim, nerînên çavan rastîya mirovan dertînin. Ez dê çend rojên dî berê xwe bidim Şino. Belkî ez wê nîşan jî bikim.

\* \* \*

18Eylûl 1946 Mehabad

payîz e, li dil payîz e, li xwezayê jî û di rûyên xelkên mehabad de jî payîz e, êdî ew geşbûn û devlikenîn a mehên Sibat û Adarê xwe ji ser rûyên wan dane alî. Çî zû şahî tîn jibîrkirin!! Bi qasî xweşî û lezzetên jiyanê zû ji bîr dibin, jan û derd wî qasî di kûranîya dil û mejî de tîne kolan, ku nema êdî kes dikare wan birenîne.

Çipikin hûrik weke pistepista du evîndarên tirsonek vê êvarê dibarin, çirayên kolanan ronahîya xwe ya xemgîn û

204

kêm li jêr xwe dirijînin, tu dibêjî kodikin ji şîrekî zelal in  
di dest bêrîvaneke dil tenik de dema ku çav li şivanê jê hez  
dike dikeve!

Hevalên min her yek bi kar û barê xwe mijûl e, kes ji bo  
min ne vala ye, Nûrî Emîn nema xuya dike, ew enîya  
Seqizê bernade, ji xwe Mustefa Xoşnaw li Bokan e, ez  
xwe bi tenê dibînim, yek caran hevalên xwe yên pêşmerge  
li qeyserîyê dibînim, lê bêtirî çend deqe yan em li hev  
nasekinin, tenê silaveke sivik weke ya mûrî û gêrikan  
dema di xêzika xwe de li hev rast tîn dikin û em her yek bi  
alîyekî de diçin. Berî çend mehan ez vala nedibûm serê  
xwe bixurînim, ji dibistanê diçûm ba kalkê xwe, ji ba wî  
diçûm çayxaneyê, pişt re min berê xwe dida çapxaneyê,  
her roj min Mujde didît. Jiyana min dagirtî bû, niha weke  
tûrekî hatîye dawêşandin, pûç û vala û bê wate ye. Eger ne  
ew dersên xwendin û nivîsandinê bin ez dê dîn bibim.  
Hevaltî ya ji dil ne hêsane, ya ne wê her kes xwe weke  
heval bide pêş, min alîkarî di jiyana xwe de bi gelek heval  
re kir, lê piştî demekê li min qulibîn û ez êşandim, carekê  
yekî ku ez naxwazim navê wî jî bibêjim, bêbextiyek li min  
kir û hindik ma bû ez li hebsê biqelibandima, sûcê min bû  
ku min bi dilekî saf ew kire dostê xwe, lê çi bikim, dilê saf  
ne destê mirov de ye, dana xwedê ye.

Emîral axa jî nema van rojan xuya dike, hema wî jî pişt  
xwe neda be komarê!! Dibêjin ew gund bi gund digere û  
avê pars dike, hin jî dibêjin ew li çare yekê digere da ku  
derya Ormîye bigihîne ya Qezwînê û pişt re Mehabadê  
bikişîne kenarê wan!!

Aaaax kî nalînên min û jana bêrîkirina min bigihîne  
Şino!?

şev dereng bûye, dengê Mihemedê Mamlê ji Gramofoneke  
dûr tê, weke çemekî biharî diherike ew deng, ez ne şaş  
bim ew deng ji mala Îmadî yê çayçî tê, ew ji dengê Mamlê  
têr nabe û li çayxaneyê xwe jî tenê qewanên wî û yê Elî  
205

Esxer bi kar tîne.

Dengê derî tê, dengê nermik û bi edeb, gelo kîye vê  
şeva payîzî, hatîye serdana min!!?

\* \* \*

Hejar bû.....

ji zû de kesî li derîyê min neda bû, heta Emîral axa jî nema  
tê parsa avê, dilê min digot wê niha Kerîm û Mujde li ber  
derî bin, û pêşbînîya Hêmin bi cih bibe. gava min derî  
vekir Hejar di reşaya kolanê de li ber derî rawestîya bû, ez  
veciniqîm, û bi devekî ji hev min lê nihêrî, Hejar kenîya û  
got: te ez nas nekirim, yan dilê te û hewandina mêvanan  
nîne!! Hişê min nû hate serê min, min lêborîn xwest û ew  
derbas kir.

-tu çi vedixwî?

-spas, şev dereng bûye ez tiştê venaxwim. Min bihîstîye  
tu dê biçî Şino, min got belkî ez karibim alîkarîya te  
bikim. -Tu kesekî li wir nas dikî?

Min devê xwe bir û anî ku bibêjim Mujde li wir e, lê  
Kerîm hate bîra min.

-Kerîmê şikakî, hevalê min e.

-ez jî dizanim ew hevalê te ye, lê ew niha bi Emerxan re

ye, xwedê tenê dizane çî tevin di serê wan de têne ristin!!  
tu nikarî wî li Şino bibînê.

Hejar êdî nas kir ku ez bêçare mam, bi devekî nerm got:  
Badîn çawa be em ji te bêtir van deveran û xelkê wan nas  
dikin, hîn saleke te li vir nebûye, gelek eşîr û serokên wan  
jî hene neyartîya komarê û Barzanîyan dikin, dibe ku tu bi  
şaşî di herêmên wan re derbas bibî, kes nizane çî tê serê  
yekî.

Min bi rûyekî matmayî berê xwe da Hejar û got: çare çî  
ye?

-dostên me yên J.K li her deverê hene, li Şino yek heye  
navê wî Kawe ye, Kawe yê terzî, ev navê wî yê nuhênî  
ye, Şino qulik bi qulik nas dike û xelkên wê jî yek bi yek  
206

nas dike. ev navnîşana wî ye û ev pelik jî kurtenameyek e  
min ji wî re nivîsî ye, tê de temîna te lê kirîye, tu gihayî wî  
êdî tu karê xwe ji min bêtir dizanî.

Min spasîya wî kir û pelika pêçayî û li ser piştta wê  
xudaperestî ştêkî çak e nivîsandî berda berîka xwe.

\* \* \*

23Eylûl Mehabad 1946

Ba awazeke

birîndaran dilorîne

Demsalên rêwî xatir dixwazin

Û pêtên di gewriya min de

peyvan mîna

pelên payîzê dişewitînin

êdî bihna şewata asoyan , ji vî dilê min tê.



Îro ez ji birîna xwe ya dawî vegerîyam. ji Şino vegeriyam.  
Dema min Kawe dît, di serî de min pirsî Kerîm kir, lê ew  
ne li Şino bû! Kawe got ew çûye Zîndeşt û bûye  
şêwirmendê Emer xanê şikakî.

-û Mujde!! Min bi dengekî nizim pirsî.

-ew jî yek caran diçe Zîndeşt, eger şansê te hebe em dê wê  
bibînin. Ê me berê xwe da taxekê li bakurî bajêr.

Roj li ber ava bû, min nizanîbû evîna min jî êdî diçe ava,  
min nizanîbû ez diçim jivana rewrewkê û dê dilê min yê tî,  
tî tir vegere!!

Kawe ez li ber derî hiştim û xatir ji min xwest û bi  
devnarmî got: bira eger tu bixwazî vegere, tu mêvanê minî  
û pişta xwe da min!!

Min li derî da, jineke dora pêncî salî rûtirş derî vekir.

-xêre kurê min, te çi divê!?

-ez Badîne Amêdî me, ji sablaxê tîm, Mujde li vir e!?

bêyî ku jina rûtirş gewdeyê xwe ji ber derî bide alî, li pişt  
xwe zîvirî û bang kir: Mujde, Mujde yek li te dipirse.

Çiqasî gotina (yek) ez êşandim, naxwe ez yekim, ne  
Badînim, ne dildarê Mujde me û haya Mujde êdî ji min

207

nîne, ne jî qala min ji tu kesî re kiriye!! lê min xwe girt û  
ez li ber derî mam, kêlîkek ne çû reşê Mujde xuyabû, dilê  
min weke daneyek genimê têkeve ber du kevirên destarekî  
har, hate hêran!!

-ew kî ye? Bi dengekî ne xweş pirsî.

-nizanim, yek e li te dipirs e, dibêje ez Badînim!!

Weke ku navê Badîn Mujde veciniqîne di cihê xwe de sar

bû, ne gavekê bi pêş de hat, ne yekê bi şûn de, lê ceger hate min û min bang kir: Mujde ezim.

Naçare hate ber derî û ew jinik bi paşde çû heta ku di tariya odayekê de winda bû. Mujde bi sarbûneke ku min xeyal nedikir hate pêrgîna min, min di çavên wê de hezar xefk û tore dîtîn û di her yekê ji wan de qetek ji dilê min û parçeyek ji giyanê min hebû!! Hemû bayêm ku Kerîm qala wan dikir jî hebûn. bi dengê bê evîn û bêrîkirin got: bi xêr hatî.

-malmîrat qey tu bîra vegeerê nabî?

-vegerim ku?

-vegere evîna xwe, vegere dibistanê, qutabîyan, vegere Mehabad!!

-Mehabad!! Mujde bi devekî ji hevbûyî got weke ku nû navê vî bajarî dibihîze. Ez ditirsiyam ku haya wê ji bûyera min û Jale li mala keçikên Cihû heye, yan têkilîya min bi wan jinan re bihîstibe, min bi tirs pirsî:

-Mujde çi qewimîye, bêje!! Ê hêsir di çavên min de biriqîn.

Min nema zanibû çi bikim, volkana bêrîkirinê ya di dilê min de veketibû, bi rawestina Mujde ya mîna pûtekî ji qeşayê re vemirî, ne got derbas be , ne jî li halê min pirsî û ne jî gotineke xweş ji devê wê derket, tenê got ma kî min li Mehabad heye!!

Min bê xatirxwestin piştî xwe dayê û bi gavin teles û dilekî şikestî vegeerîyam mala Kawe.

Piştî min şîv xwar, min raza dilê xwe ji Kawe re got ku

208

dixwaztim îşev ji Şino bidim rê, lê wî bi nermî ji min tika kir ku li ba wî bimînîm heta sibehê, pişt re ew dê min bişîne gundê Zîndeşt yê Emerxan, lê min sebr û aram nemabûn, Kawe bêgav bû û hespek bo min amade kir û bi siwarekî re di wê şevê de ez şandim Urmîye. Sibehê zû ez gihame bajêr û ji wir min bi tena xwe berê xwe da gundê Zîndeşt.

Bayekî nerm û hênîk ji gola Urmiye hildibû, li dilê min jî bahozeke dîn hilbûbû, ber rojava ez gihame gund, min gelek zehmetî nedît ku koşka Emerxan nas bikim.

Dema tê ghiştin ez ji Mehabad tîm gelekî kêfa xwe anîn û Kerîm ez bi Emerxan dame naskirin û jê re got : ev Badînê Amêdî ye ji Mehabad tê!! Emerxan di serî de pirsî rewşa komarê kir, pirsî Pêşewa û Barzanî û kesên dî kir, min quto quto bersiv dida, Emerxan bêyî ku ez tu pirsan jê bikim got: tu dizanî kurê min ez ne ji tirsekê dûrî Mehabad ketim, na!! şikak tenê ji xwedayê xwe ditirsîn, lê ez dizanim ba ji kîjan alî hiltê, komar bi temamî ketîye hemêza Rûsan û Azerî jî hêdî hêdî gund û erd û milkên me dadîqurtînin, çavên Rûsan lê ye milkên me li gundîyan belav bikin, ev yek jî heta ez li darê dunyayê me nabe. Kurê min ezê çîrokeke bêbextîya Rûsan ji te re bibêjim, şerê Mameşa tê bîra te ne?! piştî wî şerî, Haşimof bi lez hate gundê Sere li Seqizê, ez û Qazî û Mele Mistefa û Mîrhac û Mistefa Xoşnaw dawetî civînekê kirin, tu dizanî çi gote me? Weke ku axayek bi xulamên xwe re bixeyide, wî tilîya xwe di rûyê me de bilind dikir û digot : eger hûn gaveke din pêş de biçin, em piştgirîya we nema dikin!! tu

dizanî ku şah bi xwe ev gotin ji me re bigotina, diva bû em çavên wî birijînin!! ez gelekî hêrs bûm lê xwedê jê razî be, Qazî doza aramîyê li min kir, bawer bike ne ew bûye min dê rûyê Haşimof tijî tû bikira!! ew kîye fermanan bide me?! ne tenê weha, lê wî dixwest me weke zarokekî di bin baskên Azerîyan de bilorîne!!

209

Piştî bêdengîyeke ne dirêj Emerxan got: her yek berê kevçî dide xwe, ez jî naxwazim ku êla min bêpar bimîne. Min got: komar niha ji her demê bêtir bi hacetî te û şervanên êla te ye, ne mumkine tu di vê rewşê de piştî xwe û hezar siwarên şikak bidî komarê!! serê xwe hejand û hinekî bi simêlên xwe lîst û got: wext derbas bû!!

Min ne dixwest ez bêtir biaxivim û bêdeng mam, Kerîm tê derxist ku gotinin ji bo wî di devê min de hene, destûra Emerxan xwest û em derketin û çûne odeyeke dî rûniştin. -Bado tu û van deran!!

-ji dilê min bipirse Kerîm, dilê min ketîye xefka bayê evîna Mujde. Û min serpêhatîya xwe jê re got, lê wî gelekî guh neda min û janên dilê min, bi ken got: ez bi her bayî dikarim, lê bayê evînê....!! Ew xefk e.

-Kerîm rastîyê bêje, çi qewimîye!?

-hîç, Mujde ye û tu wê nas dikî, ne li ser hev e.

-hûn venagerin Mehabad?

-niha na.

Min tiştêk safî nekir, wê şevê pê de Kerîm ji min re qala Rûs û xayintîya wan dikir, û digot: divê em berê xwe bidin

Emerîka, ew hêzek e xurt e û xuyaye lingên xwe di cîhanê de bi cih dike!! mesela ku ez ji bo wê hatibûm ne dianî ser zimanê xwe, heta destê sibehê em şiyar man û behsa me tenê li ser cûreyên bayên ku ji xefkan direvin bû.

Dema sibehê min karê xwe û vegeerê kir, Emerxan gote min: ji Pêşewa re bibêje ku av hate bin cilika yekî, divê kirasê xwe hilmale!!

\* \* \*

26Eylûl 1946 Mehabad

Îro min her sê zarokên Mustefa Xoşnaw (Pirşeng, Perî, Şêrîn) li nêzîkî Karwanseray Seyid Elî dîtî, dema çav li min ketin hatin pêşîya min û bi yek dengî û bi kêf gotin: baba hatî ye!!

210

Kêfa wan li min jî veda, min ji zû de ew nedîtibû, û ez di vê diltengî û bêzarîya xwe de, bi hacetî dostekî me ku dilê xwe jê re vekim û bibêjim çi hatîye serê min û çi nehatîye serê min. hîn ez û wan diaxivîn, jîpa Mustefa Xoşnaw ji hêla Kangay Hizbî Demokrat xuyabû, meydana çarçira derbas kir û hat li ber me rawestîya, ku çavên wî li min ketin, motorê Jîpa xwe rawestand û bi lez xwe jê avêt û hat ez hemêz kirim, sivik li hal û demên min pirsî û zarokên xwe yek bi yek rakirin û ramûsan. Di jîpê de yekî rûniştî hebû li dirêjahîya kolanê dinêrî, cil û bergên firencî lê bûn û xuyabû ew ne ji Mehabad e, min ji Xoşnaw pirsî: mêvanekî te heye!?

Bi kêf got: ev Qedrî Beg e, kurê cemîl Paşa ye, îro ez û wî ji Bokaan hatin, ew ji Kurdên Sûrya ye û bi zor û heft belan

xwe gihandî ye komarê, de ka silavekê lê bide.  
Dema min bihîst ku ew ji Kurdên sûrî ye, di cih de  
Nûredîn Zaza yê min ew di girtîxane yê de dît hate bîra  
min, Celadet û kovara Hawar hatin bîra min, min bi kêf  
berê xwe dayê û xêrhatin pê kir, wî jî bi rûyekî geş silavên  
min vedigerandin. Dema M. Xoşnaw dît me pirsar hal û  
ehwalan dirêj kir, kenîya û got: Badîn ez bawerim mala te  
li van nêzîkîya ye, lê xuyaye tu ne mêvandostî!?  
Nû hişê min hate serê min û min ew dawetî mal kirin.  
Min fikir ku xwarineke Mehabadî ji mêvanên xwe re  
amade bikim, lê Mustefa Xoşnaw got ku me li Kangay  
Hizbî demoqrat, kebab xwarî ye. Cirra mêvanê min xweş  
bû, wî gelekî behsa rêya hatina xwe fikir û zehmetîyên ku  
li nava çiyayên Zagros dîtibûn beyan fikir, her car  
dikenîya û digot: qantir ji qantirê ku ez lê siwar bûbûm  
serkeş tir nînin, nêzîka deh caran ez ji ser piştta xwe dame  
erdê, carekê hat ku min di gelîyekî kûr wer bike!! Yek  
caran jî lingê xwe yê ku ji keviran çelitî bûn, şanî me fikir.  
Em hinekî li ser mesela tîpên Latînî jî axivîn û dema min  
behsa Celadet kir, tozekê rûyê wî sar bû û bêdeng ma, pişt  
211  
re got: heyran ev tîp ne milkê mala Bedirxanîya nin, berî  
wî Xelîl Xeyalî dest pêkiribû!!  
Ji axaftina Qedrî beg xuyabû ku ji Celadet nefret dike, min  
jî gelekî neda pey wî. Berî ku rabin herin jivana Pêşewa,  
min bi nîyaz jê re got: eger te Nûreddîn dît ji kerema xwe  
silavên min lê bike. Ê min jê re bi lez çîroka xwe û dîtina  
wî li zindanê got.

Hinekî bi hatina van mêvanan dilê min vehesî, naxwe  
dengê komara me sînor derbas kirin û haya Kurdên sûrya  
jî jê heye!! Aax kalo, xwezî tu sax bûya û min ev yek ji te  
re bigota, gelo te yê çi bersiv bida min!!?

\* \* \*

10Çirîya Pêşîn 1946 Mehabad

dûr be ji çavan, dûr e ji dil!! nizanim kê carekê li ber min  
ev metelok got?! Lê ya ku ez qenc dizanim ew sedî sed ne  
rast e!! vaye Mujde dûrî min ket û ez ji dilê wê jî  
dûrketim!! Lê ew çiqasî dûrbe , nêzîktirî dilê min e!

Ez van xêzikan dinivîsim weke ku bi gwîzaneke tûj li ser  
rehên dilê xwe binivîsim, îro nameyek ji Mujde hat, na!!  
ne name bû, biryara kuştina evîna min bû.

Dema çavên min li kaxezên pêçayî ketin, dilê min lerizî û  
min got: vaye ez hatim bîra wê!! Lê çaxa min ew vekirin û  
xeleka ku min ji wê re kirîbû tê de dît, dîn bûm. Bi rastî jî  
ez nema dizanim çi binivîsim!! Bi tayê kîjan peyvan tevna  
birînên xwe birêsim?! Nayê bawerkirin!! Hîç nayê  
bawerkirin ev bûyera han. Ewqas evîn, ewqas bendewarî û  
çira û mûmên hêvîyê yên ku min yek li pey yekê bi giyanê  
xwe yê şewitî vêdixistin, bi pifekê re vemirîn!! Çi dibe!?  
Mumkin e Mujde jî mîna Jale be!! Kalkê min tenê jin nas  
kiribûn, lê min bi ya wî nekir. Mujde xwe bi nivîsandina  
lêborînekê, yan zelalkirina biryara xwe ya ji nişkê ve jî  
newetandîye, tenê du gotin, mîna du gulleyên tewş ku ji  
tinga koçerekî di kezeba xezaleke berîyê de bibihurin,  
nivîsî bûn: bibûre Badîn!!

212

Ez dê çi bibûrim û çi nebûrim?! Her ku yek dilê min bihêre û weke weşîyekî tirî biguvêşe, da ku têra xwe meyê vexwe, wê bibêje: bibûre!! Ev çi evînin ku tenê bi du peyvên dilkuj, bi dawî dibin!! Ev çi xewnin ku bi qêrîna keleşêrekî re têk diçin!!

Dilê min û tiştêkî nemaye, ma dilê min bi xwe ma ye!! Ez dê dilekî nû û sade ji ku peyda bikim?! Xwezî cesareta min hebûya ez werîsekî ziravek li stûyê xwe bigerînim û mirina xwe ya ku ez li hêvîyê, zû bikim!! Vê carê ez dê dîsa biçim Şino, çawa be divê ez biçim, venagerim ta ku her tiştî fêr bikim.

Ev bûye bêtirî salekê ku me sînor derbas kir û bi hêvî yeke mezin hatin vî erdî, min digot: ez dê birîna dilê xwe li vir derman bikim!! Min nizanîbû ku qederê birîneke nû ji min re amade kirîye!! Îcar li kîjan erdî ez dê vê birînê derman bikim!!

Dîsa dengê cîrana min tê, strana xwe ya xemgîn û bi şewat li ser birayê xwe dibêje:

çendan ki guftem xem ba tebîban  
derman nekerdend miskîn xerîban.

\* \* \*

15Çirîya Pêşîn 1946 Mehabad

Emîral Axa mir!!

Îro berî roj di hemêza Lendî Şêxan de binive, ez ji diltengîya xwe derketim û min berê xwe da Sablaxê, û çûme Baxî Qazî, êdî payîzê rê ji zivistanê re vedikir. bayekî sar dihat û baraneke hûr dibarîya, dema çavên min li refên Mehabadîyan ketin, ez behitîm!! Gelo di bin vê



barana hûr de û li ber wî bayê sar jî seyran dibin!! Ji himhima xelkê û rûyên wan yên xemgîn, xuyabû ku bûyereke ne asayî qewimî ye, ji nişkê ve çavên min bi Agop ketin, wî jî mîna her kesî ziq li pêlên sablax seh dikir.

213

Dema li pişt xwe zîvirî û ez dîtîm, bêyî ku silavê bide û bibêje: Barêv (merhba bi Ermenî), kenîya û got: Badîn hevalê te xwe di çem wer kir!!

-hevalê min kî?

-Emîral Axa.

û bûyer li ber min weke rûpelên rojnameyekê raxist: Min ji xwe re vedixwar, ez nû ji goristanê dihatim dema çavê min li Emîral Axa ketin. Wî xwe tazî kiribû, çipikên baran a hûrik weke hêsrana bi ser bedena wî de diherikîn, satila xwe ya sifir di ava Sablax dadikir û bi ser xwe de dirijand, xelk pê dikenîyan û dipirsîn: tu çi dikî? Ew jî dikenîya û digot: ez bedena xwe ji baranê dişom!! Nêzîka sed satil av bi ser xwe de kirin û hey digot: vê baranê ez lewitandim, ez riswa kirim!!

Ji nişkê ve, satila xwe avête çem û berê xwe da me û qêrîya: bê derya nabe, ev neh mehin ku ez dibêjim, lê we guhên xwe siwax kirine.

Û xwe avête nava avê. Berî xwe biavêje nava avê, min bi çavê serê xwe dît ku ew bi xwe bû av, erê Badîn bawer bike, ne ku min vexwarîye û tişt li ber çavên min xuyadibin, na! Ew bû av û herikî çem! Tu bawer nakî ne!? -ez bawer dikim, ew av bû, û bû av, veqerîya eslê xwe!!

-ez jî dê bi vê bimrim.

Agop got û şûşeya xwe ji bin çengê xwe derxist û qurtin hov lê xistin.

Xelk li bedena wî digerin, gelean digotin: eger em bibînin divê bi lez em wî bibin Mizgewtî Sûr û limêja mirîyan li ser bikin. Min jî bi dengê nebihîstî got: hema li ser çem limêj bikin, ew û Emîral axa yekin!! Ê min berê xwe da Kangay Hizbî Demoqrat.

\* \* \*

20Çirîya pêşîn 1946 Mehabad

Êdî ez her pênc rojan dinivîsim, taqeta min ya nivîsandinê 214

kêm bûye, berê min rojê dikarîbû deh rûpel binivîsandina, lê niha!! Ez rûpelekê dinivîsim, dilê min sar dibe, di gel ku dilê min tijî kul û xemin, û şikestina ku tê de qewimîye, hîç ne dihate bala min. Ji xwe helbest!! Tu dibêjî qey me hev bi sê telaqan berdaye, ne ew li min dipirse, ne jî ez. Îro min di neynikê re li xwe nihêrî!! Bi dehan mûyên spî di nav porê min de xuya dikirin, gelo ez pîr dibim yan jî her janek di serê min de dibe tayekî spî?! Digotin porê spî peykê mirinê ye, her weha delîlê giranî û aqilmendîya mirov e!! berf li çiyayên bilind dibare.

Di komarê de bûyerin hêjayî nivîsandinê naqewimin yan ez wan hêjayî nivîsînê nabînim. Meha bihurî Qedrî beg hatibû Mehabad, Barzanî û Pêşewa û wezîrên komarê dîtin, çû ziyareta pêşmergeyan di enîyên şer de, û weke min nivîsî hate mala min jî, lê em gelekî bi hev re neman, min dixwest rewşa kurdên sûrya jê bikim, pirsaw Hawar û

Celadet, pirsâ Nûreddîn û endamên Xoybûn û tevgera siyasî ya wî parçe yê ku haya me jê nebû bikim. Mixabin ew bêtir li mezinan digerîya, min jî ne dixwest ziyareta wî bi pirsên xwe yê dîn xera bikim.

Niha ez bi tenê me û dilê min jî bi tenê ye, evîna tê de weke birûskekê her car dikire şîqînî, sar bûye, êdî ez pê dihesim ku ev dil nema lê dide, nema gupgup jê tê. Ez yek caran Menaf li ser lingan dibînim, bi lez diçe û tê, weke yekî li tiştêkî xwe yê winda bigere, ji bilî: (tu çawayî? Başim, bi xatirê te). di navbera me de nemaye! Ez nizanim çi diqewime, lê dilê min dibêje: ne tenê evîn herifî, komar jî diherife!! Ez naxwazim bawer bikim, lê her bûyer vê yekê diyar dikan.

Baran bi xurtî dibare, kolan tarî û bêdeng in, tenê sîrkesîrka pênuşa min e li ser van rûpelên bêdeng.

\* \* \*

215

20Çirîya pêşîn 1946 Mehabad

dîsa şev e, dîsa baran e, dîsa tenêtî û ev rûpelên weke qadeke spî, weke dilê zarokêkî çend salî. Dîsa meyê serê min girtîye û weke çemçikekê dîza xeyal û bîranînan tev dide. Ez nema Agop li meyxaneyê dibînim, ew her gav li ber kêla serê hevalê xwe ye û digirî!! Stranin Ermenî gelekî xemgîn dibêje û hêsiyan weke barana ku vê şevê dibare, tîne xwarê. Geyayekî şîn li ser gora kalkê min bilind bûye, nizanim ji hêsrên Agop e, yan ji Vodka ya ku ew li ser dirijîne, yan ji ber vê barana payîzî ye!!

Weke dînan li Agop hatî ye, na çima ez nabêjim ew dîn

bûye!! Her ku ez diçim goristanê û wî di wî halî de dibînim, girîyê min jî tê, ez têra xwe digirîm, ne li ser kalkê xwe yê ku mirîye, lê li ser evîna xwe ya ku têkçû ye û nikarim jana têkçûnê ji tu kesî re bibêjim. Rojekê min Menafê Kerîmî dît û min jê re çîroka xwe got, ew kenîya, erê kenîya û got: Badîn ji têkçûneke mezintir bitirse, binêre av gihiştîye bin cilika me hemûyan!! Ne tenê Emîral axa bû av, em hemî dê bibin av!!

Em hemî dê bibin av!! Berfa evînê dibe av, ango hêsr û rondikên çavan!! Komareke weke Mehabad wê bibe av, her tişt av e û li avê vedigere!! Ji xwe tirî bi guvaştinê dibe aveke xwedayî û mirovan dîn û serxweş dike, êdî çima ez nabim av!!

Cixare ya dehan e ku ez di xwelîdankê de vedimirînim û tîna dilê min û hêrsa wî hîn daneketîye!! Eger zimanê vê xwelîdankê hebûya, wê bigota: hey malwêran, te ez şewitandim. Lê dilê min?! erê ziman nîne lê bi sed zimanî ji Mujde re dibêje: hey malwêran te ez kirim kavi!!  
Mîna kalîna kundekî, gupîn ji dilê min tê.

\* \* \*

25Çirîya Pêşîn 1946 Mehabad  
-Seyfî Qazî nexweş e, meida wî diêşe.

216

Îro dema min Menafê Kerîmî dît, ji min re got, min lê vegerand: xwedê sihetê bide wî û vê komarê.

Weke ku gotina min bi wî sert hatibe, got: komar wek hesin e Badîn, guh nede nûçeyên dijminan!!

Min ew li çayxaneyê dît, bi tenê bû û çend kaxez di bin

paxila wî de bûn, min ne pirsî ew çi ne? wî bi xwe -dema dît ez li wan dinêrim- got: ev kaxez yên Pêşewa ne, divê ez ber êvarê bigihînim destê wî.

Nizanim çima ku behsa Pêşewa dibe, werîs têne bîra min!? bîna werîsan -ji bilî şewatê- ji peyva Pêşewa tê, gotina Pêşewa bi xwe, pêçan û badana werîsan tîne ber çavên min, gelo mumkin e rojekê ev bêbextên Eceman, stûyê Pêşewa yê nazik têxin bin rehma werîsekî ne zeytkirî!? Erê mumkin e, madem ku yeke mîna Mujde diltenik û rû nerm û diloan dikare vî dilê bêxwedî bide ber kêran û wî bike hezar qet, Ecem jî dikarin Pêşewa bidin ber barîna werîsan, ma ferq çî ye ku komarek ji holê rabe, yan evînek bi dar ve bibe!?

Mujde her gava ku ez didîtim, hezar qitik ji çavên wê difirîyan, min digot ez nêçîrvanê bê xefkim, û min di kûranîya çavên wê de dinêrî, lê min nizanîbû rojekê ez dê têkevim ber diranê xefka sozên wê yên bi hingiv pêçayî, min nizanî bû sozên wê jî gelîyekî ji yê Derbendî Bazîyan kûrtir û diwartirin, lê ez tê wer bûm û dilê min bû hezar qet.

Evîna wê komara min bû, wêrana min e niha ew evîn, ez dê çawa vî dilê xwe li ber bixim ku careke dî ew hatîye xapandin?! çawa wê dil xwe ji zenga evînê bişo!! hezar baran û lehî divên ku dilê min yê hişkbûyî, careke dî vejînin.

Ez dê ji Barzanî re çi bibêjim? ji Sadiq Behadîn re çi binivîsim? ji taxa Xirê û dibistana Seadet û der û dorên ku bûne şahidê vê evîna kuştî re çi bibêjim!!dilê min heye ez

bi lez biçim Şino û heta xwedê hêz dabe zengeloka min  
217

biqîrim: Mujde çima!!

Ya rast ew e ez ji ber van birînên xwe baz bidim û herim  
Seqizê û dîsa têkevim nav refên Pêşmergeyan, ez ji bo şer  
çêbûme, ne ji bo evînê!! berî ez bimrim, divê ez vê evînê  
bi destê xwe bikujim.

Yek caran evîn mîna meyê ye, yekî serxweş û teles dike,  
yek caran jî evîn bi xwe xençerek e mirinê di xwe de  
vedişêre, evîna Mujde him mey bû, him jî xençer, ez têr  
serxweş kirim, û niha jî kefen li giyanê min dipêçe. Ev çi  
şikestinin dilo?! ev çi xefkin tu weke koran tê werdibî!! Ev  
çi agir e, bi te dikeve!

Carekê Mujde ji min re got: mirovê evîndar şervanekî di  
cengeke giran de ye, serketin jî mumkin e, kuştin jî  
mumkin e. Vaye ez tême kuştin bi hêsanî û kes nîne  
xwînrejîya kezeba min rawestîne. Xwezî tenê min  
zanibûya kê dilê Mujde ji min standîye.

\* \* \*

1Çirîya Paşîn 1946 Mehabad

Agop mir. Ne mir, xwe kuşt, xwe bi Vodkayê kuşt.

Roja ku Emîral axa xwe di sablax werkir, û Agop ji min re  
bûyer got, kenîya. şûşeya Vodaka ji berîka qutikê xwe  
derxist û qurtek e dirêj lê xist, çavên wî hatin ku derkevin,  
Vodka ya ku li dora devê wî herikî bû bi zendika xwe  
damaland û got: Badîn mirinek hebe bila mirov bi vê  
bimre, ne di nav pêlên Sablaxê de!!

Duh hêvîya wî pêk hat, ber rojava min xwe amade kir da

ku biçim dersên xwe yê nêvarê li merkezî ferheng  
)navenda çandê) bidim, berî ez herim wir, weke ku heft  
kes ji min re bibêjin here goristanê û ziyareta kalkê xwe  
bike!!

Dema ez nêzîkî gora kalkê xwe bûm, çavên min li reşê  
Agop ketin, min got: ew mîna hercarê serxweş bûye û  
ketîye xew, ez nêzîktir bûm, çavên min li şûşeyeke Vodka  
218

şikestî ketin, û xwîn herikî bû, xwîna xalo Agop herikî bû  
-vê dawîyê min jê re digot xalo- wî piştî ku têra xwe  
vexwaribû, şûşe şikandibû û bi qetekî rehek ji qevdika  
destê xwe yê çepê qetandibû, pê re qayîşa seeta wî jî  
qetîya bû. Sê şûşe vala li wir bûn, lê min nizanîbû gelo  
hemî vexwaribûn, yan hinek jê li ser gora kalkê min  
rijandibû!!

Ez weke dînan vegeîyam, û min xeber gihande  
fermandarekî leşkerî, wî jî xeber da kaptên Hemîdê  
Mazocî yê ku li jîpekê siwar bû û berê xwe da cihê bûyerê,  
çend pirs ji min kirin û dawî di rapora xwe de nivîsî:  
Agopê Ermenî, xwedîyê meyxane yê, xwe bi qetek şûşe  
kuşt.

Û termê wî li ber gora kalkê min binax kirin.

\* \* \*

8Çirîya paşîn 1946 Mehabad  
ji Kerîmê şikakî nameyek kete destê min, siwarên şikakan  
êdî kê m li vir tene xuyakirin, çendek dixwazin bi Barzanî  
re bimîni, û hinek ji wan jî ji keçên Mehabadîyan zewicîne  
û bêgav mane ku li vir bimînin, wekî din hemî şikakî çûne

warê xwe, tu dibêjî ev der bo wan warê kozê bû, êdî zivistan e dê berê xwe bidin germîyanan!! Ne komar û ne Kurdistan, hîç di bala wan de nebûn, tenê hatin pezê xwe çêrandin û çûn!! Ne tenê ew, lê gelek ji êlên din jî koç dikin, ew dibînin ku êdî qelsî diherike rehên komarê û Ecem ji dil dixwazin vî xakî zeft bikin, tirsê min ew e ku pêşbînî ya kalkê min rast derkeve û ev komar li ber pifeke navnetewî bi hewa bikeve!

Ew kesê ku name da destê min, bi lez xuya bû, heta min rûyê wî jî xweşik nedît, hema pirsî: tu Badînî? min got erê, û kaxezên pêçayî radan destê min û bezîya hespa xwe. Min hîn name venekirîye!! Berî ez wê bi çavên xwe bixwînim, min ew bi dilê xwe xwend, ez dizanim ku

219

xeberek xweş tê de hatîye nivîsîn, ji ber ku bi xêzeke ciwan navê min li ser hatîye nivîsandin: ji bo hevalê hêja Badînê Amêdî.

Badîn

Silavên germ. Di heftîya li pêşîya me de, daweta min e, ez dê gelekî kêfxweş bibim bi beşdarîya te, ez ji barên jiyana koçerîyê westîyam e, êdî divê ez bizewicim.

Başê ez hatim bîra Kerîm, dostanî û hevaltîya rast, di şahîyan de kifş dibe, di zorî û dijwarîyan de, ji xwe dost û hogir têne bala mirov, lê di şahîyan de!! Yekcaran mirov xwe jî ji bîr dike. Lê gelo wê Mujde were dawet û zemawenda Kerîm?! Bê guman erê, ew mîna bavekî ye ji bo wê, û bawer nakim ku wesyet û temîna bavê Mujde ji bîr kiribe. Ez dê biçim dawetê, fersend e ji bo dîtina



Mujde û bidawî anîna vê têkilîya me ya ne zelal, vê evîna me ya ku her carê bi gwîzanekê tê serjêkirin.

Rewşa komarê aloz û dûgirtî ye, mumkin e destûra min û çûna navçeya şikakan nebe, her kes behsa Emerxan û têkilîyên wî yên nû bi dewleta Hemeriza re dike, êdî ji devê hinekan tê bihîstin ku ew xayin e û piştî xwe di tengayî yê de daye vê komara reben!! Ez bawer nakim ew xayin be, lê xwendina wî ji bûyeran re ji ya me hemûyan rasttir e!! wî heftê sal kirine, qet nebe wê salan ew fêrî alîyên ku bayên xurt û bi hêz jê hildibin, kiribin.

\* \* \*

220

Tu

15Çirîya Paşîn 1946 Mehabad

tê çî binivîsî li ser van rûpelên sar!! Tê çawa bûyerê bawer bikî ey dilê koçer!! Te bi çavên xwe dît û bi guhên xwe bihîst. tingetinga saz û tembûran bû, hay û hoyaya dîlangeran bû û teprepa lingên wan bû li ser wê qada ku bûbû şahidê kuştina evîna te ya dawî!!

Baraneke hûrik weke lorîkan dibarîya, xwendina pirtûkeke pîroz bû li ser giyanekî li ber mirinê, wê katê gora evîna te dikolan.

Kê gote te: here vî dilî bide ber bêdilovanîya kêran? Kê gote te: evîna xwe biajo dawîyeke ku nedihate xeyalan? Kê gote te: mîxê dawî di darbesta hêvîyên xwe de bikute?. şikakan ne tenê piştî xwe dane komara te, lê kozika evîna te jî kevir bi kevir hilweşandin, Kerîmê hevalê te, endamê J.K, nêçîrvanê bayên biyan tu dawetî mirina te kir, û bi

şahîya xwe dilê te gurand!!

Zave ew bû û bûk jî Mujde bû!!

De tê çî binivîsî ji bilî helbesteke xeniqî ku tîpên wê ji

arîya vî dilê te yê sotî hûnandî ye!!

Emerxan piştî xwe da komarê, şikak li pey wî çûn, ne xem

bû, lê dilê te li pey xwe weke bazekî birîndar bihêlin!!

Çima û hezar çima têra vê pirsî bê bersiv nakin!!

Kî hat û dilê te ji cixareyên xwe re kire xwelîdank, kî hat û

dilê te ji xwe re zîn kir û giyanê te weke toza li pey

siwarekî, li pey xwe hiştin, kî hat û çengek axa sar avête

ser giyanê te yê vêketî.

Te bi çavên xwe dît Mujde qutîya tûtina te, ya ku Jale ji te

dizî bû, bi nazikî dirêjî zavayê xwe Kerîm dikir!! Kerîm jî

bi kenekî bihîstî spasîya wê dikir û cixare li pey cixareyê

dipêça, giyanê te bû yê ku di nav tilîyên wî de dişewitî, ne

221

cixare bûn, evîna te bû ya ku di wê zemawendê de hate

gurandin, ne berxên şikakan bûn.

Te êrîşî qutîya xwe kir û qîrîyayî: vê pêkenokê rawestînin!

Û mîna gayekî dîn te kire orînî.

Çend siwarên şikakan hatin û bi milê te girtin û pirsîn: kî

ye ev dînê ku zemawenda me şêlû dike.

Erê pirsî dînekî dikirin û rastî tu dîn bûyî.

Zave hevalê te yê dozê Kerîm bû, û bûk dosta te, hemkara

te û destgirtîya te Mujde bû, de tê çî binivîsî ji bilî

helbesteke bêkêr!?

\* \* \*

Tê çî bikî gava ezmanê te das bin û

Temenê te  
zadekî bê xwedî be?  
Tê çi bibêjê  
Kêlîka rîman  
Di gewrîya te de  
Zeng girtîbin û  
Zîmanê te mîxkirîbe?  
Koçero  
şev pêxwas hate ber derçîka derîyê te û  
midasa te dizî!  
Tu hay nebûyî  
Berfa gellac  
Asoyên te talan kirin û  
Tu hay nebûyî  
Bayê tazî, mîna werîsekî  
Bayê koçer mîna giyanê te  
Berbangên te yên şîrmij xeniqandin û  
T hay jê ne bû.  
Çemên ehmeq, razên te ji spîndaran re  
Mîna tejjik û berran, raxistin  
Te hay jê ne bû  
222  
Di şopa te ya li ser berfa pîr de  
Qijik çêrîyan û  
Te hay jê nebû  
Erê Koçero  
Ma min ne gote te:  
Berxikan neşîne berîya bêbext

Toz wê wan birevîne?  
Ma min negote te  
Pûngê li hawîr Zomeyê biçîne  
Da ku mar nedizin hêkên Kewan?  
Ma min negote te:  
Rêbirr tîn  
Hay ji stûnên konê xwe hebe?  
Birînên xwe veşêre!!  
Tu diçûyî  
Bi herdu guhên mîna qamîşên cinnan şimakirî  
Dengê min jî mîna şûtikekî  
Li newqa çiyayên te yên paye  
Digerîya  
Aware diçûyî  
Çolbirr diçûyî  
Di nav rewrewkê de, li şoxa xwe digerîyayî  
Kê gotîye te  
Rewrewk bersiva pirsên koçerî ne?

\* \* \*

erê koçero  
stêrikan (stêrikên bê nan û xwê) xewnên te  
ji Cinawiran re digotin  
ma te nedibihîst, tiqtiqa wan bû  
bi qelûna te ya bê tûtin, dikenîyan!?  
û min hey ban fikir Koçerooooo  
dûr neçe, wê kolosê te bidizin  
û kodika te ya tijî nabe, birevînin

223

û hey tu diçûyî jivana şoxa xwe.  
Evîna wê ya xapînok, zixt li te didan  
Ji ber laçîna di lingên te de  
Refên kewan difirîyan  
Gur li pey te digerîyan  
Ma te nizanîbû Koçero  
Bîna te ji berfa qeşmer tê?  
Çendî min gote te  
Ji Mazîçinan bawer neke  
Li berfê ewle nebe  
Te guh li min nedikir û diçûyî  
Dengê min di tirafa kerrbûna te de  
Mîna berrûyan teqîya  
Weke toza havîneke deştê li pey te kişîya  
Û tu li min nezîvirî.

\* \* \*

tê bîra te  
ma tê bîra te, me li ser agirê xezaman  
di payizan de qehwe çê dikir?  
Tê bîra te  
Me sê qutî tûtîn li ber tavapeyvê şewitandin?  
Wê demê giyanê me jî dişewitî  
Lê kî hay ji giyanan heye?  
Û kê ji min û te pêve, tîna şewatê naskirîye?  
Tê bîra te  
Me rûyê sibehan  
Bi hêsrê xwe dişuştin  
Û ew di piyalên xwe yên vala de dilorandin

Wê demê min gote te:  
Dûr neçe Koçer  
Wê şalik û şapa te  
Li bazaran bifiroşin û  
Te ji Koçerî bixin  
Lê tu çûyî  
224  
Tenê çûyî  
Weke dareke Miradan  
Û axîna dawî ji evîndarekî yargawir  
Tu diçûyî  
Bi gavin teles û  
Awirin şêt  
Mîna çemekî xilmaş diherikîn gavên te  
şopa te  
mirin ji mijê didot  
êdî gavên te  
mîna goşîyên rezekî berdayî  
hişk dibûn û  
dengê min - weke ku gewrîya min jî şimakirî benedihate  
te  
\* \* \*  
erê koçero  
te zome li dû xwe hişt  
bi meşkên ku mîna dilê  
te dikirin xuşîn  
bi agirê ku li nava kuçikan bûye arî  
û bi konên bendewar

zozan jî  
mîna berbejnana  
li milê çiyana dilerizîn  
kî diwêre vê şevê berbejnana bixwîne!?  
Dengê min jî  
Weke gîsnekî di berfê de jibîrkirî rizîya  
Û tu nehatî  
Erê Koçero tu nehatî.

\* \* \*

20Çirîya paşîn 1946 Mehabad  
bûyerê di ji bîra te naçe, çend rojî tu di binê xênî de mîna  
qetek cawê ji terzîyekî zêde bimîne, rûniştî, ne diçî nava  
hevalan (gelo êdî wê bawerîya te bi kîjan hevalî were!!) û  
225

ne jî li pêşmergeyan vedigerî.

Tu naçî dersên êvarê yê zimanê Kurdî jî, de binoşe heta  
tu dikarî wê meya ku wê dawîya te bîne û dawîya derdên  
te nayîne.

Carekê Kerîm di şevbuhêrkekê de gote te: Badîn tu dizanî  
dema ba radibe ewr çî dibêjin? û bêyî ku tu bipirsî çî,  
bersiv hat: ewr dibêjin: ya rast ew e, em xwe ji ber bidin  
alî.

Te jî xwe ji ber tu evîne neda alîkî, neketî taldeyan, te xwe  
neveşart, de êdî binêre çawa ewrên evîna te qeto qeto  
dibin!!

Yek caran li serê te dixê tu biçî gilîyê xwe li cem Mele  
Mistefa yê Barzanî bikî, lê hîn hinek mejî di serê te de  
maye tu dibêjî: kî wê di vê mija komarê de li dengê dilê

serjêkirî guhdarî bike? dijmin êdî diranên xwe ji goştê komarê re tûj dikin, guh ji bo gazinên te re ne amade ne Badîn!!

Dibêjin Qewam hêzên Îranî amade dike da ku bişîne Azerbaycan û Kurdistanê, destek jî ji Emerîka stendîye û Rûs, aaaaaaaaaaax Rûs!!

Ji xwe yê piştta komarê şikandî ye Rûs in, evîna te jî di erdê dan. Ne dengê dilê te tê bihîstin, ne jî gazî ya Pêşewa, herdu jî weke nalîna birîndarekî di kûranîya newaleke dûr de ne, haya tu kesî ji wan nîne.

Tûdewîyan li Tehranê dixin zindanan, Rûs jî çavê wan li petrola bakur e, wê kî evîna te biparêze? ne ji petrolê buhatir e, ne jî ji endamên Tûde.

Kê bawer dikir tu li vê evîna xedar bilikumî!! te digot: êdî dil hinekî fêrî lîstika evînê bûye!! lê xuyaye hîn dilê te nezanê berê ye.

Roja tu hatî Mehabad, mijê xwe li dor te û giyanê te û rojên te û vî bajarî gerand, te nema ber xwe didît, her der mij bû. tu jî li Mijabad bûyî.

Te digot û dinivîsand li ser van rûpelên ku kes naxwîne: ez  
226

bîna mirina xwe dikim, weke çawa yek bîna berateyekî bike, lê ew bîna vê evîna te bû Badîn.

û mirin!!

yek caran herifîna evînekê ji sed mirinî xedar tir û dijwar tir e, ne wisa bûya Xecê xwe di gelî wer ne dikir. û dawîyên evîndarên mezin ne ew qasî xemgîn bûn. cara dawî te destê xwe avête bejna Jale, destê te şil bû!!



Jale bûbû jineke ji mijê û li br çavên te û li ber germîya evîna di dilê te yê kor de bû dûman û bi ezmanekî winda ket.

tu bayekî dîn bûyî Badîn.

dara tirî ya ku şîn nedihat ji nişkêve vê payîzê goşiyên mewîjan lê xuyabûn, kengî tirî lê ketibû!! tu jî nizanî, te roj bi roj av dida û te kir û ne kir çare ne bû! vaye dilê te jî bûye goşiyek ji birînên sor.

227

Çira çarem

Giyan zeyta wê ye

228

Badîn êdî ne ditebitî, nîvdînî bûbû, li kolanên bajêr li dilê xwe digeriya, diçû ber derîyê dibistanan, Mizgewtî şaderwêş, Gerekî şiwanan, meydana Çarçira, Kûçey Cûlekan, Gerekey hermenyan û der û dorên wî bajarê ji mijêke tîr hatibû ristin, xwe ji ber pêşmergeyan vedişart, nedixwest dev ji Mehabad berde, di gel ku zanibû êdî qedere dev ji wî bajarî berdide, hêza xwekuştinê bi dest ne diket, ne diwêrbû xwe bikuje, her di wê bawerîyê de bû ku mirina wî nêzîk bûye û qederekê ew ajotîye wê derê! her ku berê xwe dida Şino kela dilê wî radibû û weke gurekî dizûriya, xelek li dor stûyê Mehabad tengtir dibû, Barzanîyan êdî rewş naskiribûn, yeka yeka ji bajêr vedikişiyên weke ku mîx ji textekî werin hilkişandin. Xanim û Sultanê jî nema xuyabûn ku biçê kela dilê xwe li ba wan hênik bike, û li ser singa yekê ji wan bigirî, hinan

digotin berê xwe dane Filistînê, hinan digotin çûne  
Tehranê, hin jî di wê bawerîyê de bûn, ku wan ew qase sal  
kar ji Rûsan re dikir û niha li Moskoyê ne!!

vodka jî êdî nema bi dest wî diket, ew vodka ya ku çî birîn  
di giyan de hebe derman dike, evînê weke berfa li ber  
tavikê dihelîne, derdan weke ewrekî li ber bayê kurr  
belawela dike, ba!!

ji xwe dema ber guhê wî diket ku Mujde ji Kerîm bi  
hemil bûye, dihat ku serê xwe li dîwarên kolanên çavbitirs  
bixe.

229

wî di wan deman de nas kir ku Jale li Oxford ê xwendina  
xwe ya zimanê Ingilîzî tamam kir, û di rêya hevalekî xwe  
yê zanîngehê re navê wî Krîstof bû Kerxaneyên Londonê  
hemû nas kirin, ji yekê diçû yekê û bedena xwe li ber  
sakûlên wî bajarê mijokî radixist weke çawa parsekan  
desmal li ber deriyên mizgeftên Silêmanîyê radixistin.  
Badîn nû pê hesîya ku Jale helbestên Goran wergerandin  
ingilîzî û ji Ingilîzan re digot ev helbestên minin!! nû pê  
hesiya ku Jale digihişte kîjan deverê birîneke nû ji dilê wî  
re amade dikir. dema di nîvê şeveke wê payîzê de li bin  
dara xwe ya tirî rûnişt û cara yekê berê xwe da ezmanekî  
bi şaxên wê darê veşartî, dît ku goşiyên mewîjan  
dawerivîne, keser hılanî û got: jiyane min e ev, ne dara tirî  
ye!!

nizanîbû di kîjan kat a dîn de ev dar bi ber bû, êşa dilê xwe  
zanibû, lê raza vê dara derewîn ji hev dervedixist.

sala 1941 an hate bîra wî, dema Jale li Bexdê dixwend,

havîneke germ bû weke her havînên wî bajarê efsaneyî,  
Badîn pey wê ketibû, û li Çayxane ya Şawil yê cihû li  
hêviya wê runiştî bû. çayxane li kolana Xazî bû li ser  
kenarê çemê Dicle. çend cixare şewitandin û bédeng li  
pêlên çemê westiyayî dinêrî. qiralê Iraqê Feysel li Şeqlawe  
bû, û qetliama Cihûyan dest pêkiribû, Jale nehate ser soza  
xwe, ma kê diwêrbû ji mala xwe derkeve wê demê?weke  
çawa Dicle ji Amedê diherikî ber bi Bexdê ve, evîna xedar  
ew jî ajotibû Bexdê. Jale li hêviya behaneyekê bû ku neyê  
wî nebîne, Cihû digirtin û didane ber kêran, dilê wî jî li ber  
kêrên derewên Jale bûbû Cihûyekê bêxwedî, wê çaxê  
weke dînan li kolanên wî bajarî diçû û dihat, hindik mabû  
wî jî bikujin, lê di cî de xwe da naskirin û nasnameya xwe  
şanî wan kesên harbûyî kir. Jale xwe ji ber wî dabû alî lê  
dilê wî bawer ne dikir, pil û poşman vegerîya Silêmanî.  
piştî van salên dirêj nû naskir ku Jale derew lê dikirin, lê  
piştî çi?

230

tim dereng rastîyê ji wî re rûpoşa xwe radikir, çi rûyekî  
tehl yê rastîyê heye, ne xasim ji bo evîndarekî pêkeniyayî  
weke wî.

Mehabad êdî ji wî re bûbû xeleka werîsekî ku roj bi roj  
teng dibû, kesek ji hevalên wî yên kevin nema xuyabû,  
berê xwe dida ku jêre biyanî xuyadikir weke ku nû diçû  
wan deveran, dem jî diherikî weke dawa bûkeke li ber  
bayekî êvareke dîn, êdî nedihate bîra wî kengî hatî bajêr û  
çima? nedihate bîra wî çi karê wî li wir heye, hemû  
navnîşan ji bîrkirin, tenê dema ku bîna wî teng dibû berê

xwe dida qeyserîya bajêr ya li pişt meydana asingeran û hinekî li ber dikana kalê werîsfiroş radiwestîya, wî kalê çavkujûlî lê dinêrî û bi kenekî bêwate ji wî re digot: ha xorto!! ma te bawer kir ku êdî ba ji ku radibe?

Badîn bêdeng lê dinêrî û çavên xwe dixistin wan werîsên ku wî kalî bi çalakî dihûnan û girêk li wan dixistin, û bêdeng ji dikanê dûr diket.

êdî Badîn nema bi ser wan zevîyên spî de xwar dibû, nema zanibû çî binivîse!! dem weke avekê di ber wî re diherikî, roj û şev û sibe û êvar li ba wî bûbûn yek kat, Mehabad jî nema xuya fikir, winda bûbû, bi ku de diçû li sêdaran dilikumî û werîsên daliqiyayî bi wan ve didîtin, her der bûbû Çarçira. û her dar bûbûn sêdar. dema nîvê şevê xwest biqîre dît ku dengê wî jî nemaye!! Tewrêz kete destê artêşa Îranê, lê hayê wî jê nebû, Pêşewa û giregirên Mehabad li camîya Ebasaxa civîyan û birayar distendin lê haya wî ji civînê nebû, Esedof komek kaxez û wêneyên xwe û Pêşewa xistin bin çengê xwe û berê xwe da Ormîye lê ne xema Badîn bû, dema jêre gotin milê xwe hejandin û berê xwe da cihekî nediyar. Mehabad êdî ji Rûsan valabûbû weke ku meşkeke qul ji dew vala bibe.

Barzanîyan nav di xwe didan û digotin emê piştgirîya bajêr bikin û nahêlin cizmeya leşkerekî Hemeriza pê li erda Mehabad bikin, lê wî fikir ku van birayaran nabihîze.

231

artêşa Îranê hêdî hêdî nêzîkî bajêr dibû û her kesî dizanî bû ku êdî lîstik bi dawî bûye. Badîn bûbû weke mêşa ku di sênîyekê de li ser piştê xwe ketibe, li dora xwe dizîvirî û

nema zanîbû çawa li ser lingan raweste.  
agir bi hemama bajêr ket ya ku navê wê hemamî shîr û  
Xorshîd bû, hîn dikirin ku navê wê yê Pehlewîyan  
biguherin, hemam tev de hate guhertin û çî belgeyên  
komarê hebûn hatin şewitandin, Badîn ji dûyê reş yê agirê  
hemamê dikuxîya û di ber re digot: dîrokek tê şewitandin.  
û bê yî ku li pişt xwe binêre dimeşîya.  
pistepista ku dibihîst dilê wî diguvaşt: wê Mele Mistefa û  
Mîrhac berê xwe bidin Tehranê!! bawer ne dikir, lê dema  
ku bi guhê xwe ji Barzanî bihîst: em diçin. tilîyên xwe  
xistin guhê xwe û dîsa meşîya.  
yên ku ji Tewrêzê hatibûn tiştin nayên bawerkirin digotin,  
bi sedan kes ji hikûmeta Cefer Pêşwerî li dû otombîlan  
girê didan û dikişkişandin, hin kes bi keviran hatin kuştin  
û çendekan xwe zû gihandin sînore Stalîn û xwe di sîya  
qelûna wî de veşartin.  
bîna mirinê êdî ji bajêr difûrîya.  
dilekî wêran, bajarekî wêran û demeke wêran  
de êdî wê berê xwe bida kîjan erdê Badînê Amêdî!!  
bûyerên ku diqewimîn di ser têgihîştina wî re bûn, goşîyên  
mewîjan yê li dara tirî ya di nivê hewşa wî de di xewa  
xwe de mabûn, Jale ya ku bû heykelekî ji mijê û destê wî  
nema ji şilahî ya wê zuwa dibû, sablaxê ku dengê Emîral  
axa ji xumxuma pêlên wî dihat û çiyayên ku bajar dorpêç  
kiribûn û bayekî dîn xwe li wan dipêça, bûbûn qedera wî  
ya ku nema xwe ji pencê wê dikaribû tizgar bikira.  
pir dereng nas kir ku Rûsan peymanana petrolê bi xwîna  
Mehabadîyan imze kirin, pir dereng pê hesîya ku ewqas

tûtina ji Mehabad birin Mosko bû cixare, û dûyekî  
efsaneyê bi wan ket û rastîya dîrokê bi xwe re şewitandin,  
xwe bi tenê li wî şarî dît, qutîya wî ya tûtinê ghişte wî lê  
232

tijî xwîn bûbû, gelo xwîna keçkanîya Mujde bû yan xwîna  
ku wê dilê wî bû!!

nema ji hestên xwe fêr dikir, ya rast ew bû ku bûbû  
mirovêkî bê hest di wê dema bê hest de, her şev ji xwe  
dipirsî: kanîn ew qas pêşmerge yên bi dengê xwe sibehên  
Mehabad dinixumandin, kanîn ew qas Rûs yên ku qantir ji  
welatê Mukrîyan dikirîn û diajotin ber bi welatê berfa  
xedar ve!! kalkê wî sax bûya wê bersiva gelek pirsên wî  
bida, lê her ku diçû ser gora wî şûşeyeke Vodka rijiyayî li  
ber serê wî didît û axeke şil.

şevêkê hîva çarde der û dor ronîkiribûn berê xwe da  
çiyayê Xezayî û bi jor ket, her ku bilind dibû Mehabad  
biçûktir dibû heta xwe gihande serê çiyê nema bajar  
xuyabû, ew jî nema ji bajêr ve xuyabû.

li mala wî, piştî heftiyekê ji hilkişandina wî ya ber bi  
lûtkey çiyayê Xezayî ve kaxezek zer li ser maseya wî ku  
li ser dinivîsand şemitî û bi bayekî nerm re derkete  
kolanên Mehabad, tenê du xêzik li ser nivîsandî bûn,  
qutabîyekî wî çav lê ket û nas kir ku nivîsandina  
mamostayê wî ye, dema lê nihêrî bi dengêkî nizim û qeto  
qeto xwend:

jiyan .....zengilekî....dengbilinde,....lê nayê.....bihîstin,  
...tenê....yê ku jiyana wî.....bi dawî bûbe ...dibihîze  
ez jî...kerr...bûme ..nema..tu..dengî..di....bi...hî.....zim.

Badîne Amêdî

Mehabad

17ê kanûnê 1946

Hemû çirayan vemirînin, Pêşewa qazî Mihemmed êdî ber bi sêdara

Çarçira yê ve diçe

\*\*